ROMAN

ROMANÊN KURDÎ

KURMANCÎ

2

Havîna 2017 an

NAVEROK

ROMAN

Mirî ranazin

Mirina Kalekî Rind

Mirineke Kedî

Mişk û Mirov

Pêşmerge

Reş û spî

Ristemê Zal

Rojek Ji Rojên Evdailê

Şahzadeyê Qiçik

Sê şev û sê roj

Serok Altaxus

Şevên Pirag

Şeven Spî

Siltanê Fîlan

Sivêtlana

Şivanê Kurd

Siya Evîne

Şopên Geş

Sorê Gulê

Wêran

Xalê Min Ferîd

Xeca berlînî

Xezal

Xezeba Azadiyê

Zaroka Şevê

Zeviyên Soro

ROMAN 2

MIRÎ RANAZIN

Çîrok
Istanbul-1996
NAVEROK
MIRÎ XWEŞIK IN
Guhê Jêkirî
Ava Şîn
Bêhna Qedexe
Gula Omeriyan Têlo
Keldûman
MIRÎ RANAZIN
Li Şermola
Reşikê Şevê
Dilê Bêderî
Komara Dînan
Çîroka Dawî
Ji bo Apê Mûsa Anter
Tê bîra te,
ew dara ku te li hewşa xwe çandibû, vaye..
di ser dîwaran re, şaxên wê gihiştine hewşa me jî, li Amûdê.
MIRÎ XWEŞIK IN
Guhê Jêkirî
Kêlîka ku ket derî, devê diya wî bi gazekê ji hev vebû:
-Lawo kanî guhê te Remo... Rebeno?!
Bi dengê diya wî re, destê wî dirêjî cênîka wî bû. Tiliyên wî li şûna guhê wî yê çepê vala çûn û hatin. Remo veciniqî. Çavên wî çûn nava serê wî.

Diya wî bi herdu piyên wî girt. Bi çavên mişt pirs li dewsa guhê windayî nerî. Serê wî zîvirand. Guhê rastê di cih de bû, lê hinekî sor bûbû.
Gotinên diya wî mîna dilopên tirsê bi ser de hatin xwar:
- Qey naêşe lawo, kê wilo kir ji te Remo?
- Na, naêşe sibe ezê herim cem bijîşk.
Lê (sibe) nehat û... nehat.
Raket, rabû dît ku hîn şev e. Demjimêr digeriya. Bû heft. Bû deh. Şev neçû. Rojek din çû, lê roniyê neda ser reşahiyê. Ji nişkê ve bû qerebalix. Xelk derketin nava gund û li çareyekê geriyan, ku ji vê rewşê derkevin. Bû xirecira gundiyan:
- Ka em çi bikin?!
Hinek beziyan mizgeftê û dest bi nimêj û gaziyan kirin. Hinekan rojî girtin, şekir û berx kirin "sedqe." Sibehê dîsa ro nehat der. Teneke derxistin. Wekî berê dema ku heyv veşartî.dima, bi dar û bêran kirin teqereq. Vê carê ne heyv, ne sitêr, ne jî ronahî, tiştek nedihat xuyakirin. Herdem, ji bo ji reşahiyê rizgar bibin, xort in dişandin bajarên dûr. Wan jî ev bersiv bi xwe re dianîn:
- Ev karê Xwedê ye... ev ne karê me ye!..
Bi vî awayî gund bûbû kulmek tenî.
Dizî pirr bû, kuştin zêde bû, kertfiroşên şensê (yanesîb) bûn bisedan. Boyaxçî, etar, dendikfiroş, namûsfiroş, cûzekar, qumarçî, qaçaxçî, bazirganên bêbext, sikakên gund tijî gemar bûn.
- Gund ji her tiştê paqij, paqij bû.
Roj bi roj, xelkê ronahî ji bîr kirin û bûn hevalê şevê. Reşî bû konê tevan. Karê xwe, wek berê, berdewam kirin. Lê Remo nikarîbû ev rewş bipejiranda, ji ber vê yekê, ji xwe re bi melûlî digot:
- Ne dûr e ez guhê xwe yê din jî li ser kim.

Tevî ku ji diya xwe sedema jêkirina guhê xwe veşart, lê dîsa jî gelek mirovan pê zanîbû.
Rojekê ji rojên Xwedê, berê xwe da bajêr. Li postê siwar bû. Remo dît ku poste incex pêncî salî bigihêje bajêr. Pîrekek di postê de za. Du sê jin avis bûn. Dawetin lidarxistin û zewicîn. Dîsa poste negihişt. Hinek mirin. Ew bi rê de veşartin û poste negihişt. Remo bû pîzot. Aramiya wî fûriya, şewitî, hat ku dev li xwe bike, ne poste, ne tirimpêl, ne kemyon, ne ker, tiştek nehat. Teker teqiyan, guhertin. Bû xirecira wî û ajovanê postê. Xwe rakişandin hev. Rêwiyan ew ji hev kirin.
Kulmoza leşkeran der bû. Serokê wan zirt lê kirin:
- Ezê guhê te yê din jî jêkim, eger tu careke din zimanê xwe dirêj bikî.
Remo bawer nedikir ku ev rawestandin ji postê bi xwe ye. Bi xwe nikarîbû. Dengê wî, her kêlîkê, bilind dibû:
-Bi Xwedê ev sûcê ajovanê xewar e.
Xwest ku ajovan “dergisyon” bide destê wî. Lê ji tirsa leşkeran newêrîbû. Pitepita wî ji guhê ajovan nediket. Rêwiyên siwarê postê li ber dilê wî didan û digotin:
- Remo, em tev de wek te ne. Ma qey tu ji me çêtirî?
Yekî qelew ji dawiya postê xwe rakişand Remo. Bi rûyekî tirş gotê:
- Ma qey tu ji xatûnê yî û em ji cêriyê ne lawo? De bihêle poste bimeşe. Te serê me gêj kir, heyran. Xwedê ji te razî be, em dixwazin rakevin.
Pistepist xurt bû. Remo kêfxweş bû. Çend mirovên din ketin rêza wî. Zarokan dest bi girî kirin, bêhtir kêfa wî hat. Çare ew e, ku ew bibe ajovan. Lê dema ku nêzîkayî li ajovan kir, tiliya wî çû ser bişkokeke sor û dewisand. Poste mişt leşkerên har bû. Bi qepera Remo girtin. Tu kesî negot çima. Bû birebira leşkeran:
- Kî mêr e, wê wekî Remo serê xwe rake?!

Serî tev bi hev re tewiyan. Kêrekê guhê Remo xist ber lingê wan. Xwîn bi qirikê ve herikî, gewdê wî jî hate xwar. Li erdê bû wek kelax. Leşkerekî guhê jêkirî bilind kir û bi sistî got:

- Vî guhî ji bîr nekin ha! Ceza wî ev e, yê ku dilê ajovanê me bihêle.

Remoyê bêhiş bi xwe re vegerandin û xelkê dest bi xewê kirin. Ji xewê radibûn, xewa wan dihat.

Berdestkê ajovan jî av dida yê şiyar. Tu kesî nizanîbû ku ew av tijî dermanê xewê ye. Tev de xewixîn. Gêj bûn. Gelek caran ajovan radiket û poste wilo diherikî. Kesekî newêrîbû bigota, “na” yan “çima?” Ajovan, dema didît ku her yek li ser guhê xwe yan pozê xwe ditirse, di bin simbêlan re dikeniya. Wê şeva giran nema xwe ji ser gund dida alî. Reşî bû kirasekî ji hesin û xwe li laşê gund pêça. Remo li gund bû Remoyê “biguhekî.” Gundî, her yek bi xwe daketibû. Çi dibû, çi dihat serê wan, digotin:

- Ev qedera me ye.

Koçên biyaniyan li hawîrdorên gund bûn xelek. Hikumetê erdê gundiyan giş li wan parvekir. Tev de kirin xwedî qad û malên çemento. Çandinî, terektor, tirimpêl, demançe û çek dan wan. Gundî, ji ber tirsa leşker û biyaniyan, ketin hev. Hinekan mala xwe ji wan re vekirin û di nav hev de gotin:

- Qedera me ye.

Lê biyanî bi birina erdan tenê qayîl nebûn. Bistan talan dikirin. Ava çem, gemar dikirin û çavên xwe berdan bênderên gund. Cênîkên Remo lêxistin. Di xwe de keliya:

- Heta vir û bes! Sibe wê bên jinên me jî ji me bistînin.

Ket nav gundiyan û zengilê biveyiyê (xeterê) lêxist. Hinekan cilikên bênamûsiyê avêtin ser çavên xwe û mîna çirçirkan xwe di qulikên xwe de, veşartin. Lê ji serpêhatiya postê zanîbû, ku pişta wî li dîwarekî ji kayê ye.

Ev gundiyên pepûk tu carî fêr nebûne ku serê xwe li ber zora biyaniyên ku dewlet ji wan re bûbû bav, hildin :
- Emê bi zorê bênderan bajon. Mafê me ye!
Dewleta me ya sosyalîst ev daye me. Şeva ku biyaniyan terektorên xwe amadekirin ji bo ajotina erdê bênderan, gundiyan rahiştin dar û kêrên xwe, tev de yekdest derketin pêşiya wan û qêrîna Remo bilind bû:
- Em vê zorê qebûl nakin. Yan em kuştî, yan em nahêlin hûn bênderên me bajon.
Deng tevlî hev bûn:
-Ji Xwedê bitirsin lawo. Ma qey çavê we têr nabe? Xwedê mala we xera bike. Xwîna we rijiyaye çavên we bavo.
Biyaniyan jî bi zimanê xwe vedigerandin:
- Cihê hûn jê hatine vegerinê. Divê hûn malên xwe barkin ,ne em!..
Xuyabû peyv nema fêde dikin. Bi dar û kêran ketin nav hev. Wê şevê mêr û xortên gund tev de mêvanê zindanê bûn. Şeva din, bênder tev de ajotibûn. Di bin siya demançên leşkeran de, biyaniyan genimê xwe çandin. Gundî tev de lingkul, devbixwîn, serpelixî vegeriyan mal. Bû kûre kûra diya wî û desmalek da dest ji bo şûna herdu guhên jêkirî veşêre. Bi dengekî xav jê re got:
- Qey qedera me ye ku em heta mirinê kole bimînin.
Remo ma bêguh. Goştê wî dem bi dem dadiwerivî, canê wî zuha dibû û çavên wî sist dibûn. Li neynikê dinêrî, ji xwe ditirsiya. Her dihat ku bipeyive zimanê wî dibû textikek kevin. Kerteke sar ji bêrîka xwe derxist. Bi çavin tijî mirin lê nerî û xwend... (Biyaniyên parêzgeha...) nifûsa wî di nav her deh tiliyên wî de, qeto qeto bû. Di pencerê re qetên nifûsê li bahozê siwar hatin. Bûn cîq û firiyan, heta winda bûn. Remo tengirîbû. Gava derket devê derî, dengê diya wî hatê:
- Vê şevê tê herî ku lawo?!

- Ezê herim nav gund yadê.
Gundî bi qelemaçan dilîzin. Malek bê qelemaç tuneye. Remo gavek avêt. Li gewdê xwe nerî, destê wî jê ket. Vegeriya rahişt destê xwe û meşiya. Hemrîn, qîza Cemşîd, yara wî ya zemanekî, hat bîra wî. Wê demê du guhên wî hebûn. Lê gava ku navê wî bû "Remoyê biguhekî" Hemrînê hat guhertin, ji wî ditirsiya jê dûr diket. Çawa berê dema wî didît kulîlk li rû diketin, niha wilqasî madtirş û rûzuha dibe, dema wî dibîne. Lingê Remo hilweşiya, ket, li dû ma, zîvirî. Di ber xwe de got:
- Wek diya min dibêje; ev jî qedera min e!..
Pisîkeke sipî xist çewalekî û berê xwe da gir. Mezelê gund. Li cem gora bavê xwe, goncalek kola.
Rahişt pisîka sipî. Herdu destê xwe li qirika pisîkê pêçan û bêhn lê çikand. Ew fetisand, zîqînî ji
pisîkê hat û termê wê li ber sola wî ket. Di guhê pisîkê de, bi nermî got:
- Tu Hemrînê yî,.. na? Navê te Hemrîn e...
...û keniya.
Laşê pisîkê di goncalê de dirêj kir û di bin axê de, veşart. Komek kevir danî jora axê. Li qelavîska rûnişt û serê xwe danî ser herdu çogên xwe. Dest bi girî kir. Çav lê sor bûn. Xwest vegere mal. Bi rê de serê wî jê ket û gindirî nav heriyê. Matmayî ma:
- Havîn û herrî!..
Devê wî, bi du lêvên pûç, peyivî:
- Tu çi serê xwe dêşînî. Ro nema tê. Nema tê. Herdu çav ji cih derketin û hêsir barandin:
-Ji bo Xwedê tê razê. Te xew li me kiriye hisret.
Pozê wî yê ketî kir xinexin:
- Hemrînê çû.. û hey çûûûûû.
Enî qul bû, şikest. Mejiyê wî li nav herriya rê rijiya û got:

- Li min bibûre Remo. Ez bûm sedema êşên te. Lê, vê jî bizanibe; dilê te jî, di qurmiçandina
temenê te de, hevkarê min bû.
Dilê wî, mîna gogeke sor, di herriyê de çikiya:
-Ez berê kuştî me!.. Kuştî jî nikaim ti kesî bikujin.
Dil, mejî, çav, dev, poz û ling tev de, di reşiyê de bûn. Ketin nav hev, bûn laşek, bûn mirovekî perîşan û jar, navê wî Remo ye. Remo vegeriya mal. Derî vekir, şev dereng bû. Mala wî du ode bû, yek ya diya wî, yek jî ya wî bû. Bêriya diya xwe kiribû. Dema diya xwe raketî didît, perî û firişte dihatin bîra wî.
Destê xwe peland. Derî li diya xwe vekir, qîjîniya kûçikckî birîndar jê hat. Termê diya wî ya werîs li qirika wê gerandî, li valahiya odê dihejiya û pisîkeke sipî, mezin û qelew û birçî li hêviya ketina laşê diya wî bû. Saw kete nav xwîna wî. Tevzînokan goştê wî cût.
Reviya, derî bi hêz girt û xwest têkeve oda xwe. Bi zirzî derî vekir. Çavên wî ketin du çavên beloq û fireh. Laşê wî jî, wek ê diya wî, di dilê reşiyê de, daleqandî dihejiya. Li zimanê xwe yê kişiyayî ziq dinerî û mîna dîwarekî derizî hat xwarê.
Ava Şîn
Bayê felekê û welatê bextreşan
Xweşik bû.
Pirr xweşik bû.
Darek ji şînan, ji êşên kor.
Kuştiyê dîrokeke xiniz û tal bû.
Dema bayê felekê li me rabû, bû hevalê çiyan, berf dawerivî, bû lehî, pêl bilind bûn, bîst û sê
salan bilind bûn, heta gihiştin bejna Fesîh.*
*Fesîh: 1968-1991. Di Ava Şîn de li hêla “Çikûrca” şehîd ket.

*Olçya: Navê gundê wî ye.
Li gundekî dûr.
Li welatekî ji tozê.
Dayikekê, xwe bi ser pêçeka lawê xwe ve, daqûl dikir. Eniya piçûk maç dikir:
- Xwedê me biparêze ji ya me hay jê tune lawo.
Lawik nexweş bû. Dikir axîn. Kalekî destê xwe danî ser rûyê biçûk û biken gote dayikê:
- Ev nalîna evîndara ye bavo! Lawikê te bi dile, diya Fesîh.
Herdu keniyan.
Lê Xwedê zane, kalo ne şaş bû. Eger kesekî guhê xwe danîba ser dilê biçûk, wê nasbikira, ku
tepe repa vî dilikî, ji bo Olçya ye. Olçya qîza Behzad e, ya ku piştî çend rojan ji çêbûna Fesîh,
ronî dîtibû. Ji wê demê ve, hezkirina Olçya bû dînamêt û ket sînga Fesîh. Ev nav (Olçya) gotina
sisiyan bû ku Fesîh, piştî 'yadê' û 'bavo.' jiber kiribû. Her mezin dibû, ev hezkirin jî di dilê wî de,

mezintir dibû. Bi hev re diçûn ber berxik û mîhan, Fesîh digotê:
- Berxikê min ji yê te xurttir e.
Olçya dixeyidî:
- Ê min xurttire, were emê şert bikin.
Her yekî berxikekî nêr tanî. Olçya bi herdu qiloçan digirt û ji berxê Fesîh dûr dixist. Wî jî bi pesnan serî li berxik germ dikir. Bi hev re dihejmartin:
- Yek.. dido... sisê.
Qerpînî ji qiloçan dihat. Hevdû didan ber poçan. Heta herdû berx sist nedibûn, nedisekinîn. Ne

Olçya ji gotina xwe dadiket, ne jî Fesîh. Bi çavgirtonekê dilîstin. Xwe vedişartin û bi ‘itkê’
dilîstin. Dibeziyan. Bi ‘laga’ dilîstin, ji ber ku Olçya li ber ‘goga kevirî’ bû û ‘diya’ wê bû, wek
zarok dibêjin, carê Fesîh ji qazîvka re, xwe dida dest Olçya û dibû ‘diya wî’ û li nav zarokan barê
wê sivik dikir. Pirr lê miqate bû. Bi hev re diçûn nêçîra gambelekan û ew li hevdû parvedikirin.
Gambelekê reş û sipî û çikçikan para Olçya bûn û hin serşîn û başoke para Fesîh bûn. Pişt re, bi
destê wê digirt û ew dibir ser avê:
- Ka em avjeniyê bikin.
Fesîh li aveke şîn û zelal dinêrî û digot:
- Çi ava me xweşik e!.. Çi ev ava şîn xweşik e. Bi Xwedê rihê min pê ve ye.
Wî wilo digot, ji ber ku av ya bavê Olçya bû. Ji bo avdana bexçan, birk tijî bû. Mîtorê avê jî tim
vêketî bû. Herdu li ser qiraxên birkê bûn.
Di avê de wêneyê rûyê Olçya dît. Fesîh ji kêfa re dîn bû. Bi kulman av ji cihê rûyê Olçya tê re
xuya dibû, vedixwar. Bê ku hayê wê jê hebe. Heta carekê Olçya têgihişt. Awirek dijwar di Fesîh
veda û kenekî bi fedî da ser her çar lêvan.
Dinya li ber çavên wan komeke tilûr û pinpinîkên rengînî bû.
Nû Fesîh bîr bir, nas kir ku ketiye goncala evîneke bêbinî. Her Olçya didît. Pê re gurmîn ji sîngê
dihat û xwîna wî germ dibû. Rûyê wê jî dibû kulîlk:
- Merheba...

Olçya destê xwe da Fesîh, wî jî tiliyên nazik, sipî û nerm guvaştin û keniya. Olçya fedî kir û bi
tinazî got:
- Bavê min li hêviya min e.
Fesîh rêçik tev lê girtin.
- Ez ji te hez dikim.
Bi gotina wî re lemên çolan şax dan. Dar bişkivîn, ber dan, heta bi lawiran serê xwe berdan ber
xwe. Bask bi dilê Fesîh ve çêbûn, firiya û nema daket jêr. Olçya bilez vegeriya mal. Ji wê rojê ve
kesin xerîb-biyanî, hatin gund. Di çend rojan de, bûn xwedî qad û mal, destê xwe xistin paşila her
malê û dest bi kirrîna axa gund kirin. Yek ji wan zêrker bû. Zêrên wî bi deng bûn. Li bajêr, ji ber
vê kef bi ser devê gelekan diket û dixwestin xwe nêzîkî wan bikin. Lê qet nediket bîra Fesîh, ku
zêr û gotinên hingivîn, wê serê Olçya berî her serî, bifitilîne. Matmayî ma, tev ku bavê wê
Behzad gundiyekî, bi şev û rojan ji bo nanê kufletê xwe, li kar bû. Roja bavê wî kontak bû û çû
ber dilovaniya Xwedê bi bîra wî ve hat. Olçya ketibû derya windabûne. Geh Fesîh dikir
“pêxember,” geh jî silav lê nedikir.
- Ezmanê sibatê geh baran e, geh ro ye, geh jî ba tê.
Yara wî ev bû.
Her dil koçer bû.
Bîst sal di hezkirina Olçya de çûn. Bîst lib ji tizbiyeke biçûk pengizîn û di dawa zanîngehê de

bela wela bûn. Ji Olçya dûr ket û di fakulta toreya frensî de bû xwendevan. Evîn di dil de şîn
dibû. Bêriya Olçya dikir, her mehekê dima digot:
- Min bêriya gund kiriye.
Eger te li mebesta wî bipirsiya dikeniya û digot:

- Min bêriya diya xwe kiriye.
Rast bû. Lê Olçya dil ji binî ve hilweşandibû. Xweş zanîbû, ku Olçya keçeke gundî ye, gund jî
perçeyek ji laşê welêt e. Welat jî cihê bextreş û melûl û bindesta ye. Lê, gelo bextreşî dikare
mirovên binamûs çêke? Agirê evînê tevlî agirê azadiyê dibû. Aramiya wî wêran dibû. Çawa
welatek seranser bibe solek ji lingekî bi qirêj re. Û tu kes nebêje "çima" her wiha pirs ji pirsê
diza. Ji zû ve gotinên wisa dihatin gotin, lê Fesîh her mezin dibû. Her dixwend. Hewqasî şerm li
ber çav firehtir, mezintir dibû. Carinan bêhn lê teng dibû:
- Tifûû... Li wilo bext, li wilo dîrok.
Gotinên bavê wî dihatin bîra wî:
- Wey li min û li vî zemanê bênamûs.
Çi zemanekî berevajî lo!..
Di vê demê de, her ku vedigeriya gund bi bêhna Olçya re giya şîn dibû. Bi deh çavan lê digeriya.
Bi hezaran gotin û gazin di serê wî de kom bûbûn. Olçya jî çavekî wê li wî bû. Çavê din li zêr û
gotinên xelkê bû. Ewr li ezman reş dibû. Li hev digeriya û dibû dûpişk. Rojekê Olçya gotê:

- Her tu tê gund baran tê. Çima?
Fesîh li du lêvên qurmizî dinêrî û dikeniya:
- Ez baran im, lê ka ku erd pê zanibe.
Olçya tê gihişt ku ew gazinan jê dike. Lê vegerand:
- Erda me serhişk e. Ma sûcê kê ye?
Serê xwe hejand û dev lêva xwe ya jêr kir:
- Xwezî min zanîba, bê çi di wî dilî de ye.
- Xwedê zane.
- Girrê te min dikuje lê.
- Yek ji Elmanyayê min dixwaze, yek ji Firensa, li wir dixwînin. Yek ji wan dixtor e.
- Lawê zêrker?
- Ew yek ji wan e. Ezê li Elmanyayê....
- Tu zanî...
-Çi?!
- Wê xwîn li ser rê birije, eger tu...
- Çiii... Bi çi mafî bavo!..
Ji ezman perdeyeke reş kete nav wan. Fesîh dizanîbû, her dûrî wê dikeve, hewqasî gotinên xelkê
jî, di serê wê de cih digirin. Carinan destê xwe jê dişûşt, lê dilê wî nedihat şûştin.
Vegeriya zanîngehê, nav civînên xort û keçên pozbilind. Nexweşiyên psîkolojîk bi xurtî serî li wir
hildidan. Bi danûstandinên dûvedirêj ve mijûl bû, lê tiştek nedihat guhertin. Eger gotina “Welat”
dibihîst, pêncî mirî, bi hev re, serî hildidan. Şiyar dibûn û agir vêdixistin. Tim ji xwe dipirsî; çawa

wê hîn xwendinê bigihîne serî û hîn.. û hîn?. Nema dikarîbû li hêviya ketina bar ji ser pişta dil,
raweste. Zor tenê kare zorê bide alî. Ne hêzeke mezin be, tu mafên mezin bicih nayên. Digot:
- Ê ku mafê xwe bi gotinên bêkêr dixwaze, wekî wî mirovî ye, yê tê ku di avê de bifetise û dest û
ling pûç bin. Em kufikî bûn bi van (daxuyaniyan) . Êdî ne bi şer be em ji şer paqij nabin.
Berî çûnê, ji diya xwe re got:
- Heta welat çênebe, ez venagerim!
...û çû.
Bi sedan çûçik, teyr û tilûr di zikê ezmên de difiriyan. Dengê baskên wan li ber guhê Fesîh dibû
mîna dengê tembûrê. Bi vê diltenikiyê têkiliya wî bi tivingê re dest pê kir. Êvarekê, tivinga xwe
sipart kevirekî mezin ji kevirên çiyê. Pê re mijûl bû:
- Xweziya min bi dilê te. Xweska mirov ji hesin ba.
Li xwe vegerand:
- Bi Xwedê birînên me karin hesin jî bihelînin.

Ez bi vê tenê dêşim. Miletek sax bûye boyaxçî û gerson û rêncberê ber destên xelkê. Tiving
hilgirt, dewsa wê şil bû. Matmayî ma. Ev çiye?
Qey hêsirên tivingan jî hene? Ev çi av e, ji ku hat, ji pêvî Xwedê, kesekî nikarîbû bersiva van
pirsan bide. Dengê hevalê wî ew şiyar kir:
- Fesîh xwe amade bike, da em herin.

Bi koma hevalên xwe re, berî da Ava Şîn. Ketin riya dijwar û dirêj. Nêzîkahî li avê kirin. Serê
wan di nav mij û dûmanê de, winda dibû. Ezman tarî bû. Peşkên hûrik bariyan. Fesîh li kêleka
Ava Şîn rûnişt û ramanên wî ew birin û anîn. Birka bavê Olçya hat bîra wî, wisa jî wêneyê wê.
Lêvên sor, dema di avê de, biçûk û mezin dibûn. Diya wî, di avê de, mîna şitlekê, şîn dihat. Vê
ava zelal, her tiştê tenik di jiyanê de, anîbû berçavên wî. Yar, dê, zarotî, bihara gund, azadî,
xortaniya zuha, çivîk, berf, gambelek, mirina bav. Hêêêêh! Hat ku bi rewşa xwe bikene. Herdu
çavên wî bi hêsirên sar şilbûn. Li tivinga xwe û li rûyê avê dinêrî. Baran xurt bû. Hevalên wî,
yeko yeko, xwestin xwe li avê xînin û derbasî aliyê din bibin. Lê, ezmanê reş û qelişî zor da zîpik
û bahoz û baranê. Xuşîn bi avê ket. Bû gujeguja pêlan û lehî rabû. Ji ber ku Fesîh pir ji avê hez
dikir û ji ber ku kêfa avê jî jê re dihat, avê rahişt laşê wî, tevî tivingê û ew ji xwe re bir. Laşê wî
bû hevalê pêlan. Pêlên dîn. Pêlên bêserî. Pêlên kesk, Pêlên sor. Pêlên zer. Laşê Fesîh ê lihevhatî,
bi pêlan re, dûr bû. Nêzîk bû, mezin bû, fireh bû, bilind bû, bilind bû, bilind bû, gihişt zikê
ezman. Laşê Fesîh bû çiya.
Çiyayekî din li çiyayên Kurdistanê zêde bû.
Bêhna Qedexe
Bêhn li çar hêlan belav bû.

Bêhneke biyanî.
Bêhneke dijwar.
Dîwarên pirsan li her alî bilind bûn. Hinek dipişkiyan, gêj dibûn û hinek jî ditirsiyan. Çogên
hinekan dilerizîn û xwîna hinekan dikeliya. Kef bi devê hinekan diket. Şûr simbêlê hinekan
nedibirî. Êş ketibû hestiyan. Gelek serî ketin gerînekê. Gelek dilan bi destên hevdû girtin û
govend gerandin. Gelek cendek û laş ji tirsan re, ji jor ve hatin xwar. Dinya li nav hev ketibû.
Kevir dibariyan. Bi hezaran çav hebûn, ku çaralî dinerîn. Ax dişewitî û ezman devê xwe, bi deh
gazan, ji hev vedikir. Gelo çi bûye? Kî dizane ev bêhna ku roj bi roj xurt dibe, bêhna çi ye? Bû
hewar hewara generalan. Artêş li nav hev ketin. Bêhnê erdê gelek paytextan hejand. Dewletan kir
qideqid û bi sedan kûçik civandin. Li şûna bêhnê, bajar bi bajar, gund bi gund, geriyan. Bi sedan
xelkên sivîl hatin kuştin; balafir, tang, top, bombe, çekên nitronî, tev de dijî vê bêhnê ketibûn
tevgerê. Li gelek cihan cihokên xwînê herikîn. Bi rijandina xwînê dabûn pey wê, hetanî ku
gihiştin şûna vê bêhnê. Bêhn ji çiyayekî bilind difûriya. Li erd û ezman belav dibû:
Canê canê canê Were meydanê
Dilê min pirr xweş e
Bi vê dîlanê
Serokên artêş û dewletan bi serê xwe ketin. Jinên wan porê xwe kişandin:

- Divê ev çiya ji kokê ve bê hilanîn. Divê ev bêhn tune bibe.
Di çend rojan de, parlamenter, hozan, siyasetvan, zana, serokleşker û xelkên wan, tev de bûn
yekdest, da ku çareyekê ji vî çiyayê bêcir re bibînin. Ne dînamêt, ne mayîn û bombe, ne jî tang û
balafiran fêde nekirin. Bêhn xurttir dibû. Her perçeyek ji çiyê diket, dibû gihayek û bêhn dida.
Bêhneke wisa, bi xelkên çiyê, ji bêhna misk û enberê xweştir bû:

Keç û jin pîr tev
Rabûn tev dest dan hev
Xort giş hatin birev
Ji bo dîlanê.
Vê bêhnê, agir di dilên wan de, dada. Bi dehan, bi sedan, xort û keçên wan, bi xwîna canên xwe,
ev giya av didan. Her kevirek ji wî çiyayî diket, li aliyê dinî çiyê deh kevir kom dibûn. Dewlet
ketin hev de. Bêhna xelkên wan, berî ya leşkerên wan, diçikiya. Xew li wan bû hesret. Nanê xwe,
berî ku bixwin, di destê wan de dibû textik. Ava xwe, berî ku vexwin, li ber devê wan dibû herî.
Li ser zikreşî, çavsorî û kînê xwedî dibûn. Her yekî dixwest goştê laşê birayê xwe bixwe. Gotûbêj
û danûstandinên li ser pêwîstiya qirkirina çiyê, lidarbûn. Dengê generalê mezin bilind dibû:
- Sê roja bêhna xwe li min fireh bikin, roja çaran, wê ev çiya tune bibe.
Kêfa wan hat. Çek û hêzên dewletê tev li çiyê bûn yek. Bêhnê, leşkerên wan li erdê kirin term.

Can ji laşên wan dikişand. Carinan sê roj, deh, bîst, sîh roj derbas dibûn, dîsa jî bêhn ji laşan
difûriya. Bêhn wekî dûmanê, ji qelş û kortên çiyê, dihat der. Rojname û kovar, bi gotar û nerînên
li ser dîroka çêbûna çiyê û çawatiya rahiştina wî ji binî ve, tije bibûn. Hineka digot:
Bêhn şaşitiyeke dîrokî ye.
Hinekan jî digot:
- Bêhn ji çêkirin û kedîkirina dewletên din e. Nemaze dewletên cîran. Cîranan ev bêhn bi ser serê
me de rakirine. Hinekên dîn ev giya çandin, xwîna xwe jî bi derewan li ser kirin û tiştek bi dest
nexistin. Ev giya şeytanî ye.
Di wan kêlîkan de, giyayekî nû bi quntara çiyê ve şîn dihat. Bi dehan pirtûk, li ser vê pirsgirêkê,
hatin weşandin. Bêhna vî çiyayî wê çawa raweste? Kuştina çiya?. Rahiştina wî?. Lê, hîn bi vî
çiyayî daketibûn, gava ku qêrîn bi serleşker û berpirsiyarekî wan ket:
- Bêhn ji çiyayekî din jî tê.
Bêhnê ew xistin gerînokê. Giya li serê wan bû tevin. Şerekî giran, di navbera çiyayan û hêzên
dewletê de, çêbû. Xwestin kevir li ser kevir nehêlin:
Dîlana şoreş e
Herkes pê serxweş e
Erd û ezman şîn bûn
Bi vê dîlanê.
Televizyonên dewletên din jî, ji xwe re, bi wan dikeniyan. Şerê napalm, balafir, bombe û artêşeke

mezin bi çiyayan re. Tiqetiqa temaşevanan bû. Li ber van wêneyên tevlîhev çiya bûn bela serê
dewletê. Xelkên çiyê jî, ji hev re digotin:
- Wey sed xwelî li serê çiyê be, eger bi van hesink mesinkan ji hev bela bibe, yan serê xwe daxe.
Herkesî jî zanîbû, ku çiya nikare xwe daqûl bike. Û sertewandin ne karê çiyê ye.
Dewletê lawirên giyaxwir kom kirin. Ew birçî dikirin û berdidan hawîrdora çiyê. Giya tev de
serqut kirin. Tayekî bi tenê dirêj nema, lê ew giya bû jehir û kete zikên van lawiran. Pê re, pê re,
li erdê digevizîn. Te digot qey ne ji niha ve, lê ji berî heft salan ve mirine. Bêhna laşên lawiran
kete nav bêhna giya û wekî mijê, bêhnên xweş û nexweş, li serê çiya kon vegirtin. Giya dîsa şîn
hat:
Dîlan gelek xweş bû
Delîl pê rûgeş bû
Dilê dijmin reş bû
Bi vê dîlanê.
Dewleta şiyar nifşek lawirên din anî. Ew jî çû. Yekî din anî. Fabrîkeyên çêkirina lawirên giyaxwir
vekirin. Çi lawirê goştxwir jî hebû, serê wî di cih de jêdikirin. Gava lawiran erd ji giya paqij
nedikirin, dewlet bi xwe, bi leşker û mirovên xwe, diketin nav erdên kesk û giya bi dev û diranan
dixwarin. Her ku bêhn, ji çiyê derdiket, giya jî pê re şîn û bilind dibû. Nû nas kirin ku giya û

bêhn, mîna goşt û xwîna mirovekî zindî, di nav hev de ne û ji hev nabin. Bêhnê şînbûn û
bilindbûna giya geş û gurr dikir. Ji ber vê, lawir û ajel nema di ber pirbûn û gurrbûna giya re,
digihiştin. Dest bi vekirina dibistanên taybetî yên perwerdeyê kirin. Mirov fêr dikirin, bê çawa ji
bo bidestxistina siberojeke xweş û qezenckirina pereyan, divabû ku hînî xwarina giyê bibin. Bi
hezaran mirov bi rola lawiran rabûn. Hinek jî bûn lawir û mejî û giya û kevir û ax û goşt û nan...
dixwarin. Nema li tiştekî dipirsîn. Çemên dirêj vexwarin û miçiqandin. Berê xwe dan heta bi
ezman û xwestin wî bixwin. Lawir ji mirovan pirrtir bûn. Bêhn jî girantir dibû. Giya bêhtir belav
dibû:
Ev bêhna çiya ye
Hawîrdor giya ye
Wek bêhna bûka ye
Bêhna vê dîlanê
Dewlet bû dewleta lawiran, lawirên zer, şîn, sor, reş, giyaxwir, goştxwir, mirovxwir, baranxwir û
Xwedêxwir. Lê, bêhnê serî li wan gerandibû. Ketibûn xeleka windabûnê, nemaze piştî ku kevirên
çiyayên bibêhn, diranên wan diweşandin nav axê. Polî poşman vedigeriyan. Ji hev dipirsîn:
- Gelo çawa emê vî çiyayî bixwin?

Ne giya hişk bû. Ne çiya herifîn û ne jî bêhn rawestiya. Lawiran jî nema dizanîbû çi bikin.
Dewletê, bi sedan kemyonên mişt diran, ji dewletan kirî. Bi çewalan diran kişandin dora çiyê.
Her lawirekî xurcika xwe tijî diran kir û dest bi xwarina çiyan kirin, kevir bi kevir.
Gula Omeriyan Têlo
Navê wî ev bû. Hem ziravik bû, hem jî tim li kêleka têlên sînor bû. Nobedarê pez û reşiyê û
bombe û hejarî û êşan bû
Têlo, li ser girekî bilind, li binxetê, rûniştibû. Berê xwe bi aliyê bakur ve kiribû. Dengê wî tevlî
kîna dilê wî dibû û diherikî.
Rojekê ezê...
Li bin çiyayekî Omeriyan rûnêm û ezê bigrîîîîîm û hey bigrîm.
Di tola xwe de, diramiya. Zarotiya tozgirtî. Keriyê pez ê ku ji xwe re birin. Wî çaxî biçûk bû.
Dema bavê wî mir û ew, sêwiyê Xwedê, wekî şivanekî biçûk li ber keriyekî bêserî, li hawîrdora sînorekî bê îman, bitenê hişt. Gava ku pêxember bi bîra xwe dianî, bi rewşa xwe razî dibû . Jixwe pêxember jî, wekî wî, di zarotiya xwe de, şivan bû. Têlo dest bi xwendinê kir. Tim di xurcikê kerê wî de pirtûk hebûn û tim jî li hêviya “Cibrîl”ekî bû ku nameya Xwedayê mezin jê re bîne. Lê, carinan êşeke giran xwe bi nava wî digirt, nemaze gava gotina pêxember dihate bîra wî (Ez pêxemberê herî dawî me...) Têlo pirtûk bi dû pirtûkê de dixwend, lê ne Cibrîl hat, ne jî ew hat bîra Xwedayê mezin ku nameyekê jê re bi rêbike. Wek xewnekê dihat bîra wî.
Qaçaxçiyan, bi alîkariya leşkerên sînor, ku dev û bêrîkên wan dadigirtin, keriyên pez derbas dikirin Serxetê. Têlo, ji qaçaxçiyan re, dibû “Delîl” ji

ber ku temenê xwe tev de li dora sînor bihurandibû. Bombe ji bin axê derdixist, wekî tu kerengekê derxî. Hêdîka pê dilîst û dû re dixist kîsê xwe û dianî malê. Wê şevê xwe li ser sînor ji bîr kir û keriyê wî birçî mabû. Bang li mîha
xwe ya "şigêr" kir. Mîhê herdu lingên xwe yên pêşî di sînga wî de çandin û gepa nan ya dawî
xwar. Di wê kêlîkê de, leşkeran êrîş kirin. Hema şivanê biçûk herdu destê xwe kirin mîna zirnê û
qêrîna wî li nav pez û li ezmanan belav bû. Bû xirecir û ew û pezê xwe bi hev re reviyan bi aliyê
Amûdê ve. Pez jî gava ku birçî be û li bistanekî rast bê, tev de, wekî şîşa tivingê, dikeve xêzin
rast û bi dijwarî ji hevdu belav dibe. Xwediyê bistan ber bi Têloyê reviyayî ve hat û bang kir:

- Çi heye lawo... Çi heye?
- Apo, leşker hatin me, leşker.
Dengê kalo li ezmanekî reş û tazî dilîst:
- Wey min di çiçikên diya wan kutayî. Ev bênamûs dev ji kûçikaniya xwe naqerin lawo.
Kulmoza leşkeran li wan der bû. Têlo û kûçik û ker û pezê wî tev de dan ber xwe û vegerandin bi
aliyê bakur ve. Têlo li koma çirayên hûr û vêketî yên Mêrdînê dinerî û di nava xwe de diqiçqiçî.
Termê Kalo li dû xwe hiştin li ser sînor heft heşt mîh li erdê gêr kirin, kuştin. Xwîna mîhên Têlo
tevlî axê dibû. Ax û dilê wî bi hevdû re difûriyan, digiriyan.
Rojekê ezê...

Li ser vê axê rûnim û ezê bi kulman wê bi ser serê xwe de bidêrim. Ezê girîkî bikim ku tu carî
mirov
wisa negiriyane. Ezê erd û ezman bi hêsirên xwe bişom. Têloyê biçûk, di nav lepên wan de,
dilerizî .
Yekî ji wan got:
- Emê wî bikujin.
Ê din, lê vegerand:
- Emê wî sax bibin qereqolê, wê kêfa wan bêhtir bê.
Têlo wekî çêlîke çûkekî peritî û sar, zimanê wî dilerizî û bêhest, bêdeng û bêhiş mabû.
Li qereqolê ken dest pê kir.
Mezinê wan jê re got:
- Eger tu karibî, bi dengekî, pez tev de bidî dû xwe, emê pezê te bi te din.
Leşkeran pezê wî tevlî
pezên din kirin. Dora hezar mîh û beran tevlîhev bûn:
- Divê sêsed mîhên te bi dengê te ve bên.
Xwîn bi laşê Têlo ve hat. Bawer kir. Kurtanê kera xwe şidand û li ber serê pez sekinî. Destên xwe
dan ber devê xwe û Nisêbîn, Qamişlo, Mêrdîn û Amûdê tev de, bi dengê wî re, li hev ketin.
Sêsed mîh bi hev re, bask bi wan ve şîn hatin û ber bi Têlo ve, firiyan. Çavên wî tijî hêsir bûn.
Weke kulîlka insane sor bûn. Leşker jî tev de, mîna mîhan, di cihên xwe de, kêlîkekê bêdeng
man. Lê Têlo bi tiqe tiqa kenê mezinê wan re bi xwe şiyar bû û naskir ku tu dil di bin van cilên

kesk de tunene. Yekî ji wan bi çeplê wî girt û berê wî bi binxetê ve kir:
- “Git... köpek oglü köpek!”
Têlo, sola xwe li şûna xwe hişt û xwas beziya pêxêla Binxetê. Xwest ku bombeyek wî ji hev
perçe werçe bike û venegere. Dixwest her pariyek ji laşê wî bifire hêlekê, lê daxwaza wî bi cih
nehat. Berê xwe bi jor ve kir û kela girî qirik sot:
Xwedêyo... rojekê ezê.. hilkişim cem te û ezê serê te bi xwîna xwe bişom. Ezê herdu lingên te di
nav hêsirên xwe yên germ de bihêlim, heta ku piçika qirêjê bi wan ve nemîne. Belkî wî çaxî tu bi
me hest bibî. Piştî demekê , li ser van ramanên “gawirî” poşman bû û vegeriya mal. Dilovanî ji
Xwedê xwest û her pênc xwediyên pez, ji bo vegerandina pez, ber bi serxetê ve hilkişiyan.
Ji wê rojê ve, Têlo mezin bû. Girr û kîn jî pê re mezintir dibû. Kirasê melûliyê çirand û sîngtazî li
dora sînorê bêbext bombe hilkirin. Helbest ji xwe re diristin. Li wan çolan distira, heta ku
radiwestiya dû re karê xwe berdewam dikir û li jor dinerî.
Li çiyayên Omeriyan, roj bi roj, tiştin mezin nas dikirin. Tiştin nayên gotin, lê tên dîtin. Tu nabê
ev sînor dewletan çêkirine. Dewlet jî artêş û çek û qereqol in. Têlo, ji nişkê ve, dît ku ji çar aliyan
ve laşê wî bi dewletan pêçayiye. Û li her alî jî bombe çandine. Bombeyên ku xelas nabin. Her
bombeyek radikir, deh dihatin çandin. Rojekê li qelevîska rûnişt. Serê xwe danî ser herdu çogên

xwe û dest bi girî kir.
Rojekê ezê...
heriya zivistana vî welatê bêxwedî tev de di rûyê diya xwe bidim.
Di havîneke germ de, ezê keziyên wê bi ser serê xwe de kurr bikim.

Werîsê kîn û hêrsa wî dirêj bû, heta gihişt diya wî ya reben ya ku nema dizane bê çawa di vê çola bê xwedî re derketin û çawa ew aniye ser rûyê erdeke vala û bombekirî.
Erê yabo...
Ma, ji pêvî vî sînorê bombekirî û vê erda bênamûs, te ti cih nedît ku tu lê bi cih bibî!
Nema zanîbû bê berê xwe bide kê. Xwedê, yan dê, yan jî bavê ku serê xwe danî, ji bo ku serê wî têxe nav teqereqê. Nav û dengê Têlo belav bû. Tivingên Emerîkî difroşe, wisa jî bombe, dînamêt, cil, çek, tûtin, hesin, çaya hişk û sol. Têlo filitîbû ser sînoran, li dora xeta tirênê diçû û dihat û leşker tazî dikirin. Dev ji xwendinê û şîretên diya xwe berda. Şeva wî roj bû, roja wî jî şev bû.
Dema roj diçû ava, şa dibû, rûgeş dibû û dibû mirovekî din. Dengê wî zelaltir dibû. Bavê wî mir û çîrokên Omeriyan bi xwe re birin gorê, lê çend stranên xweş jê re hiştin. Her şev li bin taveheyvê û roniya stêran, bi du çavên ji agir û seriyekî dagirtî, li wan cihan dinêrî.
Rojekê ezê...
li kêleka çiyayekî Omeriyan rûnim û ezê kevirê herî mezin bi ser serê xwe de berdim, bera perçeyek ji vî serî sax nemîne. Erê yadê, rojekê ezê xwe û te herduyan bikujim.
Xelk jî bi Têlo daketibûn:
- Têlo li tiştekî buha û mezin digere.
- Ew û Ezraîl destbirak in.

- Girekî zêr heye, Têlo lê digere.
- Ku bêhna Têlo diçe leşkerên sînor, leşker di cih de ji desthilanîn dikevin û dilên wan dêşe.
Têlo bû dêwekî ji agir û di şevên reş de diçirisî. Xelk û leşker bi hev re jê ditirsiyan.
Tim bi rextan pêçayî bû. Hewşa xwe kiribû gora tivingên Emerîkî. Geh bi bertîlan, geh bi zirtan
leşkerên Binxetê ji mala xwe dûr dixistin. Lê vê gavê bû qal û behsa ronîkirina sînor. Ji ber ku
xirecir zêde bûbû, xwestin li seranserê sînor lempeyan deynin. Nema qaçaxçî tenê diçin û tên. Bi
sedan xort û keçên şervan jî çêbibûn. Bêhna şoreşekê belav dibû.
Ji Têlo re li hev hat, digot:
- Roja ceng hebe, ew roj daweta min e. Roja bê ceng li hember van kûçikan derbas be, ew roj ne ji temenê min e. Dest bi kişandina stûnên hesinî bû. Her ji sed gavî stûnek diçandin û lempeyek datanîne ser. Her ku wan di rojê de stûnên xwe yên hesinî diçandin, Têlo bi şev ew stûn li bazarên Amûdê û Qamişlo erzan difirotin. Şirîkekî hesinfiroş ji xwe re dît û karê xwe fireh kir. Bi erebê û hesp dest pê kir. Lê xwediyên ereban newêrîbûn pê re berdewam bikirana, nemaze piştî kuştina yekî ji wan. Tev de sûnd dixwarin ku niviştin di bin çengê Têlo de hene. Niviştine Xwedayî.
Ajovanekî terektorê got:
- Min bi çavê xwe dît ku leşkerekî cercûrek sax di laşê Têlo de vala kir û Têlo nemir.
Carekê şirîkê wî pê re çû nêçîra leşker û hesinan. Têlo jê re gotibû:
- Bi xwe çûna ber xetê, ji min re, wek çûna vê hewşê ye. Ji ber ku ez sînor ji hewşa xwe bêhtir

nas dikim.
(...Ez wê şevê ji bîr nakim. Ez û Têlo, me nêzîkayî li sînor kir. Têlo sînga xwe tazî kir. Ti nivişt,
ne di stûwê wî de, ne jî di bin çengên wî de, nebûn. Xwe bi rextan pêça, rahişt tivinga xwe û min
da dû, em gihiştin pişta xetê. Li wir jî pûş digihişt kabokê. Hema gulle û bi ser me de bariyan.
Toz û dûman û bahoz tevlîhev bûn. Leşker bi tirimpêlên xwe li me digeriyan. Carekê tekerê
tirimpêla wan li pişta min ket. Min kirî bigota “teslîm” lê min negot. Eger ku gaveke din tirimpêl
vegeriya, wê ez bikuştama. Lê qey Xwedê temen dabû min, dengê ken û qerebalixa wan hat. Min
go qey Têlo kuştin, lewra ew dikenin, ez yek carî ji hev ketim. Lê mîrata mirinê tal e. Min xwe bi
qulpan û zikkişkê ji sînor derbas kir. Berê sibehê, ez nîvsax û nîvmirî, gihiştim malê. Çend pirsan
ez dabûm ber peşkên xwe. Gelo Têlo kuştine, yan na ?. Eger vê carê filitîbe, gelo wê dîsa nêzîkî
sînor bibe?. Ê min bi xwe, ez nema nêzîkayî li sînor dikim. Lê bersivên pirsên min zûka hatin ber
min. Piştî nîvro Têlo ez ji xew rakirim û got:
- Tu îşev jî nayê ser sînor?

Wê şevê dîsa tîrêjên agir zikê reşiyê diçirandin. Xelkê tev de dizanîbû, ku Têlo û leşker li ber hev
sekinîne û şerekî giran li darketiye. Tev de jî dizanîbû, wê serê sibehê bazarên Amûdê û Qamişlo

mişt hesin bin. Bê ku ti kes çavê wî li Têlo bikeve, Têlo hesinfiroş pirr kirin û ew bixwe nebedî
bû. Du hikûmet bi hev re lê digeriyan. Tirsê li hawîrdora sînor kon vegirtibû:
- Ev têl û bombe ne bes in, wê hîn kehrebê jî bînin.
Leşkeran, her ji dused gavî qereqolek biçûk li jora stûnên hesin ava kiribûn û bi şev di
pencereyên wan re nobedariya sînor dikirin. Û bi ro, dadiketin koncal û çeperan. Koncalin fireh
kolabûn û xwe dixistin pişt axa wan a komkirî. Têlo biryara xwe li ber xelkê dabû:
- Roja ku we, li ser sînor, lempeyên vêketî rêzkirî dîtin, zanibin ku Têlo miriye.
Lê, wekî bawer kiribe ku êdî ew roj wê bê.
Her ku teqereqa tivingan bilind dib,û wêneyê Têlo dihat ber çavên xelkê û ji hev re digotin:
- Vî mêrî Ezraîl ji xwe re sûnd daye.
- Bera kes, ji Têlo pê ve, nebêje ez mêr im.
Têlo rûnişt û li cihekî dûr dinêrî. Li jor dinêrî.
Rojekê ezê...
hilkişim ser serê çiyayekî bilind, li vî welatê ku ji pêvî mirov, her tişt lê mezin e. Koletî mezin e.
Mirin mezin e. Bênamûsî, xiyanet, tirs mezin e. Ezê herim jora wî çiyayê bilind û ezê ji Xwedê re
bêjim; ma qey tê me heta hetayê ji bîr bikî?! Û ezê xwe ser serî bavêjim ser vê axa bêhest. Ezê
wekî qantirekî serjêkirî, xwe di xwîna xwe de bigevizînim, heta hiş û dilê min pûç bibin.

Di wê kêlîkê de, qerebalixa leşkeran bilind dibû:
- Ev ne karê mirovekî û diduya ye. Ev karê grûpên van “Terorista” ye.
Têlo bêhna bi hezarên leşkerên, ku li ser sînor belavbûyîbûn, dikir. Zanîbû ku leşkeran hêzeke
bêserî amade kirine û stûnên xwe yên hesinî bi xwe re hilgirtine. Rê tev de li ber çavên wî hatin
girtin. Wê şevê herdu çavên xwe girtin û xwe li sînor xist. Piştî çend rojan, nema dengê qurçînan
xelk ji xew şiyar kirin. Nema tîrêjên sor zikê şevê qelaştin. Hesin li bazaran kêm dibû û buha
dibû.
Lempeyên vêketî, her şev, li seranserê sînor rêzkirîbûn.
Tenê çiyayên Omeriyan xwe daqûl kiribûn û hêsirên xwe paqij dikirin.
Li hêviya tiştekî bûn.
Keldûman
Çîroka jiyana... Mistoyê ku ji diya xwe bêdeng ket.
Û bêdeng jî...
agir laşê wî hêdî hêdî dixwar.
Misto li ber neynikê bêdeng û bi tenê rawestiya bû. Keldûman jê diçû.
Di nav dûmanê de, mat mabû. Berbangê ji xew veciniqî. Xuşexuş ji serê wî dihat. Laşê wî sincirî
bû. Bi lez çû ber neynikê û li xwe nerî.
- Yadêêêê.... ev çi ye?
Tu çi bibînî!
Nerî ku dûman ji guh û devê wî dertê. Ji nişkê ve, bi herdu destan, zeft bi guhê xwe girt. Devê
xwe jî girt. Nalînek ji kûraniya dil kişiya. Xuşexuş di serî de xurttir dibû. Nû Misto nas kir ku

keldûman jê diçe. Wisa guman kir ku p iştî çend demjimêrên din, wê piçikek goşt jî bi laşê wî ve
namîne. Kete nav pêlên ramanên reş û tirseke zor û giran:

- Gelo wê hestiyê min jî bibin dûman, yan ezê bimînim komek hestî?
Li kemenca xwe geriya û di ber xwe de, got:
- Belkî xewn be?..
Her ku diket tengayiyê, gerdûn li serê wî dihat hev, dibeziya ber bi kemencê ve. Vê care, berî ku dest dirêj bike têla wê ya şêrîn, dît ku agirek hûr ji têlan hildikişe û kemenca wî jî, wekî wî, dûman jê bilind dibe. Bi rûyekî guvaştî û laşekî lerizî, vegeriya ser nivîna xwe. Xwe dirêj kir û bi tiliyên bê neynûk axa dîroka xwe ya windayî kola... Ji diya xwe,... bi tenê ket.
Xweşiya zarokatiyê nedît. Xortanî bi tenê derbas kir. Û bi tenê jî niha laş û can hêdî hêdî dibû dûman û li valahiya ezman winda dibû.
Weyyy!..
Li min û li vî temenê vala û pûç.
Lê ji ber ku di qata şeşan de bû, dengê axîna Misto nediçû kesekî.
Ji nas û kesên derdora wî, kê pirsa mala wî dikir, digot:
-Ez cîranê Xwedê me.
Bi vê bersivê, xwe ji ber mêvanan dida alî. Tevî ku bi dehan ji xortên zanîngehê hevalên wî hebûn
. Lê, xwesteka xwediyê xanî dema ku misto kirê kiribû, ev bû:
- Divê çûn û hatin li bal te tunebe.
Ji neçarî û kêmpere xwesteka wî pejirand û ji xwe re got:
-Ev mirov çi dewar e. Nizane ku kemenca min, hember sed mêvanî ye.
Lê Misto jî nizanîbû ku her tiliyên wî yên sivik kemencê hildidin ser piyan, hêsirên zelal û hûr ji

çavên reş û xilmaş, li qata pêncan, dihatin xwar. Her êvar xwediya çavên reş û xilmaş, li hêviya
dengê kemencê, tev de dibû guh. Şeva ku nalîna kemencê bilind nedibû, xew jî nêzîkî çavên reş û
xilmaş nedibû. Lê Misto mabû dîlê çavê "Bêmal"a kambax. Tevî ku bi salan wê nabîne, lê wek
diya wî digot "dil dile, ne sênîk burxul e." Tevî ku wê dil nedîtibû jî, lê heta roja îro serî bilind
dike û pesnê xwe dide ku heta mirinê ji bavê Misto re negotiye û nabêje "na" û demek nimêj lê
neçûye. Ji ber vê yekê, hêviya wê bi bihuştê xurt bû. Lê nizanim çima li rabûn û rûniştinê, li çûn
û hatinê, tim digot:
- Xwedêyo tu me ji "munker û nekîr" ji agirê dojehê, biparêzî
Di wê kêlîkê de.
Perçeyek sax ji laşê Misto dawerivî.
Demekê zarok bû.
Radihişt pirtûkên ji xwe girantir û berê xwe dida dibistanê. Tevî ku gemar gelek caran di bin
neynûkên wî de hişk dibû, lê dîsa jî mamosteyan teva jê hez dikirin. Ji bîra wî naçe, sala ku kete
pola çaran. Navê mamosta wî "Rojîn" bû. Dema Rojîn dikir ku bi mamosteyekî din bê guhertin,
Misto serî danî ser masê û bû kûre kûra wî. Mamoste lê civiyan û pirsîn:
- Tu çima digirî?
Çavên xwe yên sor û tijî hêsir xiste çavên wan:
- Ez ji mamosta xwe "Rojîn" hez dikim. Naxwazim ji me dûr bikeve... Ez naxwazim.

Girî bi hewar û keser berdewam kir, lê Rojîn çû. Çûyîneke bêveger. Ji mêj ve, wê şagirtê xwe
Misto ji bîr kiribû. Lê Misto her tişt li ser Rojînê dizanîbû.
Mêrê wê kî ye, zarokên wê çend in, navên wan çi ne, ji dûr ji dûr her tişt dişopand. Hetanî ku,
piştî gelek sal û ji nişkê ve, hezkirina "Bêmalê" keça Rojîn di dil de teqiya û pijiqî. Pirîskên evîna
wê, bûn çemek ji agir. Bûn deryayek dadayî û nema vemirî. Berî vî tiştî, her kuMisto mezin dibû,
bav jî digot:
- Va bijîşkekî me jî çêbû.
Lê Misto bi qutîkê helaw û penêr û mûyên teriyên hespan daketibû. Tembûr ji xwe û zarokan re

çêdikir. Bê ku zanibin çi dibêjin, qîr dikirin stiranan . Her zivistan dihat, hevdû talan dikirin û
derdiketin "Bûka Baranê." Her yekî paçikek li serê darekî dirêj digerand, radikir jor û bi hev re
dikirin qêrîn:
Ya rebî baran bê –amîn
Golika me giya divê –amîn
Zik birçî ye nan divê –amîn
Me j' Xwedê baran divê –amîn
Û li cihên din jî deng bilind dibûn:
Baranê bibar bibar
Çûçika genimê me xwar
Sêwiyan serê hev xwar

Geh jî dida dû bavê xwe yê “Hecî.” Gumlekê xwe yê bipîne berevajî li xwe dikir û li ber goristanê, derdiket nimêja baranê. Dest, bi sedan ber bi jor ve dibûn û hezar deng dibûn yek:

- Xwedêyo...

Xaka me tî nehêl

Zarokên me birçî nehêl,

Xwedêyo..

Kesî me tune j’pêvî te

Vê carê tenê

Bibîn rewşa me

Geh ewir hişk dima, geh jî baran dibariya. Hîn ewir û kevir û hesp û Bêmalê û gor û baran û roj û

gumlek di serê wî de nav hev diketin. Perçekî din ji laşê Misto dawerivî û bû dûman. Roj bi roj

nas kir, piştî duwanzde sal xwendin, ku hatiye axurekî! “Ev ne zangeh e, ev nezangeh e.” Hêdî

hêdî hêviya wî bi dîtina xort û keçên rewşenbîr windadibû. Nemaze di salên destpêkê de. Kete

deryaya siyasetê û “xebata ji bo welêt”. Bi germî kar kir û her sal ev gotin dubare dikir:

-Îsal sala me ye. Îsal, emê cîhanê bihejînin û armancên xwe, bi alîkariya dostan, pêk bînin .

Lê, sal bi sal dem diçû.

Ne salek xweş hat.

Ne kesî cîhan hejand.

Ne jî dost man.

Hew tevkuştin pirtir dibûn. Karê wî mabû hejmartina partiyan û zayîna wan a her meh. Çîroka

gamêşan hate bîra wî. (Goştfiroş gamêş tev de dajotin ber serjêkirinê. Gamêş jî bi rê de li hevdû
siwar dibûn.)
Yê dilpak li jêr dima, yan jî bi bêbextiyekê wî davêtin nav şekalan. Bi tirşik û goşt û girarê hevdu
razî dikirin û dibûn serdar û “serok.”
- Xêza xwar ji gayê pîr e.
Ka, Mistoyê pepûk, di nav beroşên tirşik û germiyê de, ji pêvî ku rahêje kemencê û ji “Bêmal”a
bêbext re bide sazan, wê çi bike :
Ey dilkoçerê
Rû pêxemberê
Bûm kulmek arî
Te ez dêram li rê
Misto di çûn û hatinê de digot:
-Gurrî bûye sermiyanê mala bavê min. Tu çima nabêjî; mala bavê min qeliyaye... Loo.
Bi vî awayî, her sal, di xwendinê de, dişikest. Piştî heft salan, nû bû sala sisiyan. Pitepita bavê wî
ji guhê wî nediket:
- Heso, li gundê me hebû Heso. Her nifşek zarok li gund mezin dibû, Heso jî bi wan re dibû
heval. Wekî ku di temenekî de bin. Tu jî wekî Heso li te hatiye lawo Misto.

Bi babidestî serî dihejand:
- Hoo... weh. Çi bênamûs ji pişta min ketine lo.
Diya wî ew, di nav gazinan de, dihişt:
- Bixwên lawo bixwên. Bi Xwedê te em merezî kirin lo. Heta vir..

Perçeyekî din ji laşê Misto dawerivî. Xwe, di nav bazara zebeşan de, dît . Li kemencê germ bûbû.
Hawîrdorên wî mişt qîz bûn. Di bin simbêlan re dikeniya:
- Çiqas qîz pirr in lo.
Piştî çend sal derbas bûn, weha gotinên wî jî pê re hatin guhertin:
- Çiqas qîz pirr in, hewqas hindik in jî. Ew kî bû digot; jin hene û jinkok hene. Lê çima şensê min
tim li jinkokan rast tê, ez nizanim.
EMÎNA
Kezeb lê reş bû, heta ku Emîna anî mal. Nû wê hembêz kir, kabokên wê li hev ketin û lerizîn:
- Emîna... çi bi te hat, çi bû?
Rûzer û çirmisî got:
- Ez ditirsim.
Misto lempe vemirand. Fêde nekir, rabû ser xwe, fêde nekir. Li ber geriya, fêde nekir. Hema rabû
û xwe tazî kir. Emîna jî kabok lê bêhtir lerizîn û dest bi girî kir.
Ew cara dawî bû ku rûyê Emîna dibîne.
CEMÎLA
Kêfa xwe pirr ji Misto re anî. Wî jî, hêdî hêdî, xwe nêzîkî wê kir. Heta rojekê rahişt destê wê.
Cemîla veciniqî. Keniya û rûsor bû. Têgihişt Misto çi dixwaze. Serî hejand:
- Xem nake... Sibe ezê bêm cem te.
Bû sibe... Cemîla hat.
Lê xortek qelew û dirêj pê re bû:
- Ev kî ye îca?
Cemîla bi ken lê vegerand:
- Ev destgirtiyê min e.

Beroşek ava sar bi ser serê Misto de rijiya.
FERÎDE
Du mehê dûvedirêj ji Misto hezkir. Xwe dikir bi heyrana wî, wî jî li kemencê dixist. Geh jî
distira. Lê destpêka meha sisayan Ferîde jê re got:
- Ez nema ji te hez dikim.
Misto dîn bû. Eman, zeman, hewar.
Bi pozbilindî gotina xwe berdewam kir:
- Ev dilê min e û ez azad im.
Misto li ber rûnişt. Lingê wê ramûsand. Kela girî kete qirikê. Rih dirêj kir. Xew lê bû hesret, bû ta
û derzî.
Ferîde niha bi serê lêvan silavê li Misto dike yan nake.
ZEYNEB
Roja yekem Misto nas kir û jê hezkir. Roja dudiyan ji Misto re got:
- Ezê, heta mirinê, ji te hez bikim.
Roja sisiya Misto bihîst ku Zeyneb yek revaniyed. Şivek tûj li serê pozê wî ket.
ŞÊRÎN

Misto dabû dû Şêrînê, gula qîzên kurd li zanîngehê. Ji ber ku yên xweşik di nav wan de gelekî
kêm bûn, du sed xortî bi hev re didan dû Şêrînê. Mistoyê zexel jî yek ji wan bû. Piraniya wan yan
kinik, yan reşik, yan jî xwînsar bûn. Nalenala Misto bû:
- Tirên li orta me qelibî.
Rojekê ew û Şêrîn li hêviya postakê bûn. Dema Misto xwe ji bo silavê amade kir, Şêrîn berê xwe

guhert:
- Tifû... Li bextê reş, şensê pîs.
Poste hat, mişt bû. Misto rûnişt, Şêrîn ji piya ma. Ji ber wê rabû, dengekî nizim û birûmet jê
herikî:
- Fermo Şêrîn.. rûne.
Şêrîn bilez ji postê daket.
Li sînema zanîngehê cih tune bû. Cihek tenê vala li cem Misto hebû. Şêrîn hat, gul li ser rûyê
Misto şîn hatin. Çare tune, divê li cem wî rûne. Lê, Şêrîn ji piya ma û rûnenişt. Misto jî bi îbrî û
yûnanî dest bi xeber û sixêfan kir. Herweha qîzek bi dû qîzekê ve ji ezmanê dilê wî hildiweşiyan
û her carê jî kula Bêmalê mezintir û girantir dibû. Di wê baweriyê de bû ku evîn û mirin yek in.
Herdu carekê tenê tên. Bîranînên wî keliyan. Keliyan heta ku...
Perçeyekî din ji laşê Misto dawerivî. Pîrika wî “Fatê” hate bîra wî, dema çîrokên evînê jêre
digotin: (Hesenê mala Mûsa ez te nakim. Tu bi gul û endeko bî, li nava biharê, ez pêl te nakim.
Tu bi werîsê şala bî, ez bi te barê xwe bar nakim.
Te dît lawo Misto ku jin ji mêr hez neke û mêr jê hez bike, ew mêr xwe bikuje jê re çêtir e.)
Bêmalê hat bîra wî û bû gumîna agir di dilê wî yê şewitî de.
Çîroka dina pîrika wî ev bû:
(Pismam dotmam dixwest. Dotmamê jî çû yekî xwe kir. Wî jî jinek anî. Dotmam bi poşmanî
digot:

“Tivinga lawikê min nesranî
Min berda kelê, kel hilnanî
Ne mêrê min kir,
û ne jina ku te anî.)
Dîsa hat bîra wî, dema Bêmalê por berdida. Sed şax li ser piyan şîn dihatin. Carekê jî Bêmalê
sînga xwe jê re vekir, dused kevok jê firiyan. Lê cara ku destê xwe vekir “Bye.. Bye” sêsed kêr di
dilê
wî de çand. Niha jî dilê wî xwest ku helbestekê li ser wê saz bike:
Bêmalê/
te ez kirim bêmal /
ez hiştim zuxurek kevin li çiyayekî ku gur tenê lê hene /
lê çi bikim /
ez û ev kemence ne /
ne tilî bi min ve man /
ne jî têl bi kemencê ve man.
Misto xwe bi tenê dît. Hevalên wî xwendin qedandin. Ê ku bû mamoste, ê ku bû bijîşk, ê ku bû
parêzer. Bûn xwedî jin û mal. Hinek jî li serê çiyan bûn pakrewan û hinek bûn pêşmerge. Çerxa
demê lê fitilî û li şûn ma. Hîn xort bû, girêkên mirinê ew kiribûn xaniyekî bêxwedî û riziyayî.
Vê gavê…
Perçeyê dawî ji laş û canê Misto dawerivî.
Xwediya çavên reş û xilmaş, ya qata pênca, li hêviya dengê kemencê dîn bûbû. Dikir ku xwe

bixwe. Sê rojan, ne dengê kemencê, ne jî dengê lingê xwediyê wê, nehat. Bi bêhneke teng derket
devê derî. Bêhna dûmanê kir. Beziya çû jor. Li derî xist. Kes nehat. Bêhna dûmanê bilind dibû.
Heta jê hat qîriya:

- Agir bi qata şeşan ketiye, agir.
Xelkên avahiyê tev civiyan û bazdan ber bi qata şeşan ve. Derî şikenandin û ketin hundir. Herdu
çavên reş û xilmaş mat man. Xelk tev behitîn:
- Xaniyekî vala û bêdeng.
Li jêr kemence bûbû kulmek arî.
Li jor jî dûmaneke tarî, bi kerb, dilîst. Bi vekirina derî re, dûman derbasî poz û dev û çavên xelkê
bû. Bû kuxte kuxta wan û zarokên wan. Kuxte kuxt kete nav cîranan, kete nav tarê, nav bajêr, nav
gundan. Bû kuxte kuxta miriyê mezelan.
MIRÎ RANAZIN
Li Şermola
Şermola: Goristan e. Navê girekî herifî ye, li kêleka mezelê Amûdê.
ŞERMOLA
Nebêjin ez komeke ax im û hew. Ez şitlek ji axa herifî me. Zeman ez di vir de çandim. Mîna
guhekî me. Guhekî mezin im, tev ku ez bi gor û hestiyên miriyan pêçayî me. Lê şaxên min di
kûrahiya dîrok û demê de cih girtine. Ez ji cih nalivim. Narim cem tu kesî. Xelk yeko yeko koça

xwe bar dikin û dibin mêvanê axa min. Heval û hogirên wî, bi destên xwe, wî dispêrin reşî û
dijwariya axa min. Dengê diyan xweş tê min, dema ji zarokên xwe hêrs dibin “Wey ez te, di
Şermola de, sax veşêrim Iawo.” Bi laşên we axa min dixemile. Lê, her laşekî nû tê, bi hezaran kul
û derdan bi dû xwe de diweşîne. Erê, hûnê bên cem min. Ez nayêm cem we, hûn jî li min
napirsin. Berî sedê salan, kalemêrek di nav we de hebû. Li çûn û hatinê digot “Kerbeş divêt kerê
reş, qedrê gulê çi zanî.” Gul dibe ku ezbim, yan mirin be. Hûn di guhê gê de ne. Hûn miriyên xwe
dispêrin min û wan ji bîr dikin, bê ku hûn zanibin ku carinan civatê miriyan digerînim û bi wan re
govendê dikim. Pêkenokên li ser we zindiyan dibêjin. Bi hev re, em bi rewşa we dikenin. Geh jî
bi pergala we digrîn. Pirsekê tenê di dilê min de zîl daye. Kî ji we dimre, wî yan wê di sînga min
de vedişêrin, lê gelo we tu carî pirsî ye. Eger ku Şermola bixwe bimre, wê kî sînga xwe ji
cendekê wê re veke. Wê kî min di hembêza xwe de veşêre?

NIVÎSKAREKÎ MIRÎ

Şermola ev e. Geh bi hezkirineke mezin li ser xelkên hawîrdora xwe dipeyive. Geh bi hêrseke
xurt û bêserî rewşa wan tîne zimên. Lê tu carî Şermola xwe ji pala bajarê Amûdê nedaye alî. Bi
hezar salan, ev girê pîroz bûye balîf. Amûdê jî weke jineke spehî, lê di payîza temenê xwe de,

pişta xwe daye vê balîfa nerm. Nifşekî ji xelkên xwe vedişêrin, heta dora nifşê din bê. Wisa
ewrên êşên giran ji zik ezmanê Amûda kor xwe nedidan kêlekê. Amûda şewitî, Şermola bilindtir
dibû. Serê wî tim di nav ewran de, qelşên dirêj vedikirin. Bi sed salane ku ew li me guhdarî dike.
De ka em guhê xwe hinekî deynin ser sînga Şermola, bê ka li ser rewşa zindî û miriyên me wê çi
ji me re bêje. Ji ber ku tiştên ku ew bêje nayê gotin. Tiştê ku dîtiye tu kesî nedîtiye. Niha wê me
bibe cîhaneke nû. Ne ya zindiyane, ne jî ya miriyane. Her tişt tevlîhev e. Mirin û jiyan, şîn û kêf,
hebûn û tunebûn tev de wekî hev in. Cîhana xelkên Şermola dojehî ye, rengîne, reş di kesk de
winda dibe. Sor tevlî şîne. Spî di zer de şîn tê. Reng hevdu dixwin. Xelk hevdu dixwin. Lawir li
hevdu siwar dibin. Zarok porsipîne. Pîr û kal ji qîzên şeş heft salî re dibûn mêr. Dinya xera dibe.
Xelk li bendî baranê ne, lê ziman û penc û diran ji ezman dibarin her tiştî didin ber xwe û dest bi
derew û gez û ken û kuştin û dawetan dikin û kî mêre ku nekeve vê xelekê. Vê çerxa ku berevajî û vala digere.
Reşikê Şevê
“Çawa Hemîdo bû lawir”
Hemîdo bavê Şêxo ye. Berî bimre bi çend salan bi nexweşiyekê ket. Heta niha kes navê wê nizane. Ji nişkê ve ji xew vediciniqe û dike hewar:
- Reşikên şevê hatin min. Reşikê şevê, aaaax.
Dema ku şiyar dibe, carina laşê wî dilerize û hêsir ji çavên wî dipijiqin:

- Ez ditirsim, ditirsim.
Newêrîbû derketa ber derî ji tirsa kêr, tiving û şûrên ku li ber çavên wî kom dibûn. Hemû di nav hev de direqisîn:
- Binere, binere, govenda tivinga ye.
Ji lempe û têlên kehrebê dîn dibû:
- Xwedê vê tirsê bi serê gurê çiyê de neşîne lawo.
Karê diya Şêxo girî bû. Piştî ku dermanê bijîşkan fêde nekir. Berî demeke dirêj şûr simbêlê
Hemîdo ne dibirî. Gumegum ji lingan dihat. Cara dawî di nav destên wan de dikeniya:
- Reşikê şevê... Reşikê şevê. Reşikno herin xortan bigrin. Tayekî reş di porê min de nemaye, hîn jî hûn....
Xwedê mala we biveritîne.
Piştî heft mehan şandin dû Şêxo:
- Were bavê xwe bibe.
Ew anîn. Mabû nîv mirov. Rûyê wî qermiçî û zer bûbû. Ling lê şînkirîbûn. Hema dest digiha laşê wî, dikir ahîn. Deverek sax û bê êş, di laşê wî de, peyda nedibû:
- Xem nake bavo, çend roj in û ev êş wê here. Xem nake, lê her ku roj diçûn êş zêdetir dibû.
Qîr dikir jina xwe:
- Kanî Şêxo?...
- Va ye hecî, va ye.
Çavên xwe digirtin û devê xwe vedikir. Zimanê wî axa jiyana wî, ya ji berî deh salan ve, dikola.
(Li “Serxetê” dema min “Cemo” revand. Tu Cemo nas dikî, ne?
Cemîla ya çavgawir, qîza apê min. Spehiya qîzên Omeriyan. Bêbavê xweşikbûn ji kesî re nehiştibû. Bejinzirav, rûken û por li noqê, çavreş û

kilkirî. Hema tu ne bixwî û ne vexwî, ji xwe re lê binêrî. Min jê re got:Cemo, tu dotmama min î û divê tu ji min re bî. Got were min bixwaze. Min jî bawer kir. Gava me xwest, apê min, bavê wê gelekî zengîn bû, eşkere bersiva me da:

-Ez qîza xwe nadim yekî xizan. Tev ku tu pismamê wê ye jî. Lê mîh bi lingê xwe ye û bizin bi lingê xwe ye. Min jî yek nekir dido. Carekê Cemo li nav rez li cem paleyên kesaxê bû. Min bi çepilê wê girt û ew avêt ser hespê serreş û min ling li bin zikê hespa rewan xistin. Em tibabekî dûr ketin. Destpêkê rûyê Cemo zer bûbû. Maddayî bû. Lê piştî çîrok naskir, keniya. Min bawer kir ku ji kêfan re dikene. Di nav henekan re ji min re got; Pismamo ez tî me. Ka em avê ji cem van kesan vexwin. Bi rastî ez tirsiyam. Wê rê li min girt; netirse emê bêjin em jin û mêr in. Gava ez ji ser hespî daketim, da ez avê vexw im, Cemoya bêbext xwe avêt pişt wan mêran û kir hewar.

Vî mêrikî ez bi darê zorê revandime. Ez di bextê we de. Bênamûsan, te digot qey berê amade ne.

Wek deh kûçikên har, li min civiyan. Bi zor û heft bela, min xwe ji destên wan rizgar kir. Cemo çû. Hesp çû. Apê min, eger min bigre ew avê li canê min venaxwe, wê min bike fîşekek. Dem li ber rojava bû. Min wilo ji xwe re got; ku reşî têkeve erdê çêtir e. Min berê xwe da Binxetê. Min zanibû ku bi sedan bombe û mayîn li ser rê çandine. Leşkerên bêwijdan di kozikên xwe de ne.

Wê çaxê ev lempeyên ku niha li sînor rêz kirine, tunebûn. Ne dihiştin ti kes derbas be, ji pêvî hinek qaçaxçiyan bi zora xwe yan jî pere di devên wan de radikirin. Ez mam li hêviya kerwanekî qaçaxçiyan, lê wan ez bi xwe re nekirim heval. Min mirina xwe xist destê xwe û xwe bilez li sînor xist. Teqereqa qurçîn û tivingan ji guhê min nediket. Fîzîniya fîşekan bû, ku tîrêj di reşahiya ezman de vedikirin. Agirê wan ji dora serê min qut

nedibû. Min jî berdewam kir. Erê, dibêjin bazdan nîvê mêraniyê ye. Carcaran min xwe bi zik ve davêt erda bi stirî û kevir. Bombe li aliyekî bûn, leşker li aliyê din û ez jî di nav wan de, tî, qiriktal û zuha û xwas mabûm. Ji nişkê ve, kevirekî tûj ji ber tiliya min bilind bû û qerpînî ji çoga min hat. Wek tu ji xwe re textekî bişkînî.

Min got qey lingê min bû du perçe. Kevir di hestiyê birçî de çikiya. Qêrîna kûçikekî ji min çû.

Xwêdan tevlî xwîn û ahînê bû. Ez bi ser dev de ketim. Min got qey diranên min tev hilweşiyan.

Lê, di kezeba tariya şeva reş de, çirayên Amûdê vêketîbûn. Gava ji min ve xuyakirin, hinekî dilşa bûm. Min naskir ku min rê li xwe dirêj kiriye. Nema dizanirn dûv re çi bû. Dema min çavên xwe vekirin, min dît ku ez li mala ciwamêrekî me. Bi hilatina roka sibehê re, şivanekî cendekê min kişandibû mala xwe. Ez bi nan û av kirim:

- Şêxoo.. ka qedehek av. Qirka min zuha bû.

Rebenê Şêxo amade bû. Piyal da dest, vexwar. Li jor nêrî û dîsa berdewam kir:

- Birînên min girêdan. Min serê xwe danî û ketim xeweke giran.)

Dema wilo got, herdu çavên xwe girtin û kete xeweke giran. Carên berê, ku bîranînên wî tev radibûn, bi kurtî dipeyivî, lê vê carê dirêj kir. Kerş û gemara salan tev de dabû ber xwe. Şêxo jî guhertinên ku di rûyê bavê wî de çêdibûn didîtin. Rûyê wî zertir dibû. Dirêj dibû. Tiştê ne normal guhên wî bûn. Roj bi roj dirêj û pan dibûn. Destê xwe danî ser jêra pişta xwe û got:

- Pizikeke mezin di pişta min de şîn tê.

Jina wî destê xwe dayê:

- Lawo Şêxo werimiye.

Şiyar bû û kir nalîn. Rawestiya û bêdeng ma. Dîsa di derya bîranînên xwe de winda bû. Şêxo nema dizanîbû ku bavê wî xewnên xwe dibêje, yan bûyerên jiyana xwe şiyar dike. Ji neçarî, guhên xwe pêl dikirin û deng jê nedihat:

- Erê lawo, her tişt nayê bawer kirin. Berî ez Cemo birevînim, min deh berbejn û devgirêdan çêkirin, da ku dest li ber min hilneyne. Nû destê min giha destê wê, hema min dît, bi alîkariya Xwedê û wan niviştan, wekî ku bask pê ve şîn bên, ji erdê bilind bû. Min çavê xwe girt û vekir, min dît ku ez ji gund û rez û paleyan, dûr ketime. Hespê min bi du baskên fireh û mezin firiya.

Xelk biçûçik xuyabûn û ji jor ve dar xweşiktir bûn. Bayê serê çiyan hênik dihat. Serbilind bûm.

Heta mirinê, ez wan kêlîkan ji bîr nakim. Bera Xwedê mala dilê yekem, dilê ewilî, xera bike. Lê,

ya rast, gava ew tiştê xerab ket dilê min û destên min li bejna dotmama min hatin pêçandin,

qencên Xwedê xwe ji ber min dan alî û Cemo xistin nav destên wan kesan. Min hema xwe dît ku

li Binxetê me û şûtûrût im. Berê dinya ji aniha xweştir bû. Hewqas girr û kîn di dilan de tune bû.

Niha kes ji kesî hez nake. Yek xêrê ji yekî re naxwaze. Her yek li ber a xwe ye.

“Cara yekem bavê me Adem diya me Hawa dît, yan jî pêrgî wê hat û jê ve nêzîk bû, berf li erdê

bû. Adem pişta wê danî ser berfê û ket ser sînga wê. Hawa gotê; sare, ji serma pişt bi min ve

nema. Adem lê vegerand; Cihê zikê min germe, îşê min çi ji pişta te ye.”

Ev jî em in. Min dest bi kar kir, ji bo geppa nan, bûm şivanê xelkê. Bûm gavan. Min liqat kir û
bênder dêran. Heta çend mecîdî, qirûş, min dan ser hev û min pê piskilêtek kirî, kezeba min reş
bû. Wê demê piskilêt bi qedir bûn. Min çewalên mişt ka min lê siwar dikirin û bi peya berî dida
bazara Qamişlo. Carekê, di kelkela germa havînê de, teker teqiya û ka tev de rijiya . Hema min
çixat ji bêrîka xwe derxist, li dewsa ku ez çixarê vêxim, min agir bi kayê xist û min piskilêt avêt
nav. Agir gurr bû û destvala vegeriyam mal. Erê lawo, bi qiriktalî, min ev mal avakir. Apê min jî

fermana bavê min (Sofî Silo) ji Serxetê rakir. Hat di nav van dîwarên ku min bi xwîna xwe bilind
kiribûn de, rûnişt. Bi şev û roj Quran dixwend. Jiyana wî ev bû. Hat bîra Şêxo, gava mala xwe
ava kirin, bavê wî li jora xanî hestiyekî rût ê qehfekî keran daleqand û got:
-Ji bo kes mala me çavînî neke. Çavê hineka ji topan xerabtire.
Li ber her deriyekî ayeteke Quranê bi hevîr li dîwêr xist, pêre jî pistepista wî bilind dibû. Xwedê
me ji zikreş û çavsoran biparêze. Ev tev de li aliyekî û çavsoriya reşikê şevê li aliyekî din.
Nizanim lawo Şêxo, ez dikim nakim, kêfa min ji van kûçikbavan re nayê.
- Kî yabo, kî.?
Şêxo wilo got û bala wî çû ser reşikên şevê, lê vê carê leşkerbûn:
-Ne leşkerên Serxetê, ne jî yên Binxetê bûn. Lê, axxx bes ku min bi zimanê wan zanîba. Vê cara

dawî, li ser sînor, di “qapî”re, ez çûm Serxetê. Evên Binxetê bi min re peyivîn, min nizanîbû çi
dixwazin, ji nişkê ve şirqînî ji rûyê min hat. Ez çiqas li ber xwe ketim lawo, ev riha min a sipî û
zarokekî, ku duh ji diya xwe ketiye, wilo li min kir. Ronî di çavê min de nema. Heta Xwedê hêz
da min, min jî şeqamek pê ve kir. Hevalên wî li me civiyan û ez bi dû xwe de kişandim. Piştî nîvê
malê bi min re, ji xwe re birin, ez berdam. Bi dû de yên “Serxetê” ez sekinandim, li pasport û
firaxên min nerîn. Kir qerebalix, ez têgihiştim ku xeberan dide. Bi dû ku ji min re got; ev çiye,
min got; ez nizanim bi zimanê we bipeyivim. Ez dihatim ku ji çermê xwe derkevim. Min rahişt
firaxan û ez meşiyam, wî ji paş ve bi çakêtê min girt. Ez lê zîvirîm û min teneka rûn di nav serê
wî de pelixand. Dest avêtin demançan û bû qîrewîra wan û min nema xwe dît. Heta birayê min
hat ez ji hebsa Nisêbînê derxistim. Nizanim çima Xwedê em bê welat, bê rûmet û rezîl berdane
vê dinyayê.
Reşikê şevê hat.. hawawawa..
Cilê leşkeran lêbû. Ev leşker agir in û Xwedê wan berdaye mala me. Ne kêf, ne xweşî, ne rûmet,
li nav me nehiştine. Çawa Xwedê vê zorê dipejirîne, ez nizanim. Xwedêyo li min negir, em çi
gunehkarin lo. Van hiştiye bi zorê yek ji çermê xwe derkeve û rê şaş bike. Laşê wî tev lerizî û

lêvên wî zuha man. Şêxo veciniqî û bi herdu destan girt:
- Yabo... yabo.. çi bû?
- Reşik lawo, leşkerên reş, dernekevin devê derî. Ji bo Xwedê wê we bikujin, hatin, hatin.
Giriyê diya wî bilindtir bû û pê ve rabû.
-Hecî.. Hecî, ev ez im.
Hecî di nav destên wan de sistbû. Di xew re çû. Girî li diya Şêxo zor kir. Xwe avête kêleka mêrê
xwe û bi dengekî bi şewat û nizim dîlokên xwe gotin:
Lo lo lo lawo
Xerîbo lo lawo
Rebeno lo lawo
Wey li min û li vî dilî
Heyfa delalîkê dilêm
Heyfa destên wekî şaxan
Ku îro tev man bê tilî
Lolo lo lawo
Sermiyano lo lawo
Bextreşo lo lawo
Sermiyanê mala bavê mino lo lawo.
Şêxo nizanîbû diya wî li ser kê dike ahîn. Gelo ew li ser bavê wî, xalê wî, yan li ser xwe bextreşê
dibêje. Ji gava ku bîr biriye, heta niha, di xizmeta mêr û zarokên xwe de ye. Ji berî çil pêncî salî
ve Gotina “Na” nehatiye ser zimanê wê. Carekê jî destê xwe li zarokekî hilnedaye. Zor li kîjan
zarokî tê, dibeze cem wê:
- Yadê, ez di bextê te de.

Diya Şêxo ji dê û bavên xwe qut bûbû. Nediçûn cem hev, ji pêvî rojên cejnan û rojên nexweşiyên
giran. Temenê xwe, di xizmeta mala xwe de, derbas dike. Bi xwe zanîbû ku tu jin li şûna wê
debar nakin. Karên pir, cirra hecî, xeyda wî, xeberên wî. Tev ku Hecî bixwe, li nav xelkê, perîşan
bû . Sê caran çû hecê, hîn jî kêm kes jê re dibêjin Hecî. Teva bi navê – Hemîdo û ne“Ebdulhemîd”
bang wî dikirin. Hecî destgirtî bû». Bi ya xwe tenê dikir. Serhişk bû, lê vê nexweşiyê pişt lê
şikandibû. Bijîşkan tiştek jê re, nedigotin. Şêxo dihat ku dev li xwe bike. Madê bavê wî dihat
guhertin. Lingê wî zirav dibûn. Guhên wî dirêjtir dibûn. Rojekê, zarokekî li ber Şêxo ji diya xwe
re got:
- Yadê xalê Hemîdo bûye wek kûçik.
Diya wî şeqamek pê ve kir.
Şêxo nema hişt ku mêvan bên ber serê bavê wî. Rê li bijîşkan birrî. Nalîna bav zêdetir dibû.
Gelek kes nexweş diketin, lê kesî bawer nedikir ku rewşeke wisa seyr bi ser bavê wî de bê.
Rojekê serê sibê, Şêxo bi ahîna bavê xwe re şiyar bû:
- Pişta min çû lawo... axxx pişta min.
Şêxo mitêl hilda, çavên wî çûn nîvê eniyê. Teriyeke dirêj û qalind bi dawiya wî ve şîn hatibû.
Guhên wî bûbûn mîna du pelên darê. Zer û bi pûrt. Mûyan laşê wî veşartibûn. Poz dirêj bûbû.

Nema deng jê dihat. Dema diya wî ev rewş dît, ji qama xwe ve hate xwarê û ji ser hiş çû. Şêxo dest bi giriyekî bêdeng kir. Hêdî hêdî bavê wî li ser çar piyan ji hundir derket û li derûdora xwe dinêrî. Gava guhên xwe miç dikirin, Şêxo bitirs lê dinerî. Ne kûçik bû û ne ker, lawirekî di wê ortê de bû. Lê awirên wî wek awirên Hemîdo bûn. Şêxo bêhiş da dû. Bav berê xwe da Şermola û beziya. Şêxo vegeriya, diya xwe şiyar kir. Rûyê xwe şûşt, naskir ku ne xewne. Ramanekê li serî xist "Ev lawir canê bavê min, giyanê wî ye, laşê wî jî çû ber dilovaniya Xwedê. Bi xwe hisiya ku tevlihev dike û tiştan baş ji hevdu dernaxîne. Serê wî gêj dibû. Di wan rojan de,"Îsko" kûçik dikuştin. Geh bi tivingê, geh jî bi nanê jehirkirî. Ji ber ku fermana kûçikan li bajêr rabûbû û di raporên fermî yên dewletê de wisa hatibû nivîsandin.

Ji bo parastina mafê mirovan

Parastina mirîşkên gel

Parastina kîvroşkên welat

Em vê biryarê dadixînin holê û em sozê bi gel û dîrokê re didin, ku em kûçikekî li ser ling

nehêlin.

Bijî...

Bijî...

Bimre kûçik.

Çiqasî Îska ew dikuştin, hewqasî pirrtir dibûn. Nediqeliyan. Her dêlikek dikuşt deh, duwazde

cewrik çaralî dibeziyan. Wan jî li ber xwe dida û her rojê mirîşk û kîvroşkên malekê dixwarin.

Heta ku wan êş li Îska xist. Îska mir û kûçik mezin bûn. Dema ev raman diserê Şêxo re çûn û

hatin; "Ditirsim îska wî jî bikuje" ji diya xwe re got:

- Yadê, bavê min nexwest laşê xwe bike bela serê me, ew canê wî bû ê ku bi rengê lawirekî ji
mala me derket serê sibê. Divê em tabûtekê jê re çêkin. Ji bo ku xelk zanibin ku bavê min, wek
hemû miriyan, bû mêvanê Şermola.
Di wê rojê de Şêxo hemû tiştên pêwîst ji bo miriyekî amade kir. Du balîfên giran, di tabûtê de
raxislin û ji xelkê re got:
- Min bavê xwe şûşt, ne hewcî mellaye.
Tabût birin mizgeftê. Melleyê mizgefta mezin bang nimêjkiran kir:
- Ehlê xêrê, Hecî Hemîd çû ber dilovaniya Xwedê. Va me aniye mizgeftê, ê bixwaze li ser nimêj
bike, bila bê mizgeftê.
Pê re, pê re xelk kom bûn. Bi dû hev de, nimêj kirin. Bû pistepista wan bi dû tabûtê de "Em ji
Xweda re ne û emê lê vegerin." Çar ketin bin tabûtê û bi dorê, heta gihiştin Şermola. Xelk tev rêz

bûbûn. Hesenê Gunreş gor veda bû. Gelekan silav lê dikirin. Xwedê zane bê ev çend salin ku ev
ciwamêr vî karî dike. Xwedê zane bê gorên çend mirovan, bi destên xwe, vedane. Şêxo nedihişt ti
kes nêzîkî tabûtê bibe. Wî bi xwe tabût daxist gorê û bi hev re ax bi ser de kom kirin. Hinek
digiriyan, hinek dikeniyan û hinek ketibûn nav deryaya biranînên xwe bi Hemîdo re, dema wekî
wan, sax bû. Tev de bi xwe daketibûn. Li kêleka girê Şermola lawirek rawestiya bû û bi du çavên

tijî pirs li xelkê dinêrî. Kesên wî didîtin ,di navbera kûçik û ker û rovî û hinek mirovan de, şaş
dibûn. Zêdeyî carekê dihat gotin:
- Awirên vî lawirî ê mêrane.
Zarokan kevir lê dibarandin:
- Kûçik lawê keran.
- Ker lawê kûçikan.
- Rovî lawê pisîkan.
Şêxo û diya xwe konê reş vegirtin. Pênc rojan bin kon ji mêvanan vala nebû. Zarok û xal û ap û bira û xwarzê û birazî tev li nav hev ketibûn. Her pêncşem, mîna xelkên zindî tevan yên ku diçûn ser miriyên xwe, ew jî diçû Şermola. Wî lawirî, ji dûr ve, li Şêxo û diya wî dinêrî, dibeziya û xwe vedişart, laşê Şêxo dilerizî û diket derya ya tevzînokan. Destê diya wî tim ber bi jor ve bûn:
- Xwedêyo, tu me ji a mezintir biparêzî.
Carekê diya wî çîroka vê gotinê jê re got. Mirovekî gundî di ber çem re dimeşiya. Seriyekî jêkirî dît. Herdu lêvên wî ji hev vedibûn:
- Xwedê me biparêze ji a mezintir.
Evê gundî mat ma. Gelo çi ji vê yekê mezintir heye. Serî û jêbûye. Gewde û nexuyaye. Hîn ji
ramana xwe şiyar nebûbû, ew serî herikî nav avê û pêlan ew bilind kirin. Ji nişkê ve serî li
kevirekî ket û ji hev belawela bû. Wê demê ê gundî naskir ku a mezintir çiye. A niha herkes li ser
miriyên xwe digirî. A rasttir ew e, ku her yek bi halê xwe digirî û dilê wî pê dişewite. Şêxo jî bêpêjin li hawîrdora xwe dinêrî. Çavên wî tije av dibûn, ava tirs û belengaziyê. Berevajî çavên diya wî, ku zuha diman. Zuhabûna temenekî bi tozê pêçayî. Li çaraliyên mirî û zindiyan, bahozê

stûnên tozê bilind kirin. Yeko yeko zindî vegeriyan malên xwe. Hevalên şevê şûna wan girtin.
Xwediyê şûşe û piyalên tijî kul û derd, parsek û kesên bêwar, mêrên mîh û kerên mê, berê xwe didan ê. Mezel bibû ware diz û miriyan, bibû cihê keçikên ku piştên xwe didan kelên goran û xortên enî qermiçî dixistin hemêza xwe. Jinên bî û yên ku mêrên wan ji wan dûr, kalên li pey qîzên biçûk, jinên ku hember pere û "nanûzikê" lingên xwe hildidan û agirê xweşî û gunehkariyê laşên wan dişewitand, ev tev de li hêlekê û mirî û civat û dîlan û pêkenok û girî û gazin û hewar hewar li hêleke din. Şermola bi şev dibû kewara mêşên gêj û bê hingiv, mêşên mezin û qelew, yên sax û mirî. Qenc û xerabên Amûdê digindirîn ber lingên Şermola:
- Amûdê, bera agir bi te keve. Tu bişewitî.
Şêxo, li riya vegerê, nifir dikirin. Ji wê rojê ve gelek dibêjin, ku Şêxo dîn bûye. Her aciz dibe
Amûdê di nav xeberan de dihêle:
- Wey tu biqurmiçî Amûdê. Tu bimrî. Ez te di Şermola de veşêrim.
Ji wê rojê ve, her ji çend şevan carekê, Hemîdo diket pêşiya zindiyên ku carekê ji caran ew di saxiya wî de, aciz kiribûn. Ew ditirsandin. Xelkê jî tevan dizanîbû, ku Hemîdo bi xwe bûye Reşikê Şevê.
Dilê Bêderî
Mirina bavê Şêxo jê re bû gerînok. Nîvê şevê ji xew vediciniqî, didît ku bavê wî, wî dixwe. Her şev, her ku çavên xwe digre bavê wî tê wî dixwe. Dikeve rengê lawirekî mezin û pencên wî dirêjî çav û rû û sînga Şêxo dibin. Wî zîvar zîvarî dikin. Dike hewar, lê ti deng jê dernayê. Dike û nake dengê wî dernakeve. Li ser qêrîna diya xwe ji xew dipengize. Bilez ber bi Şermola ve direve.

Şevekê li bavê xwe rast hat. Herdu ji hevdû tirsiyan. Lawir paş ve vegeriya, dengê kesereke dirêj jê hat û di nav tariya şevê û kêlên goran de winda bû. Şêxo dest bi girî kir. Heta Xwedê hêz dabûyê kir qêrîn:
- Yaboooo...
Bi gotina yabo re mirî lê civiyan. Her miriyekî serê xwe ji axê dadiweşand û bi xwe re dipeyivî.
Şêxo tev de nas dikirin. Ji dilekî germ dikir gazî:
- Ji bo Xwedê. Ev xewne, yan hûn birra ji mirinê şiyar bûne?
Miriyekî kal keniya:
- Kurro qey te ji bîrkir, ku tu li Şermola yî?
- Na, lê ez dizanim ku mirî ranabin, tim razayî ne.
Tiqetiqa miriyan bilindtir bû.
- Mirî li Şermola ranazin, bera ji îro pê de tu jî yek ji me bî, serseran.
- Gelo ez jî mirî me, ez bi xwe nizanim?.
- Na, na, niha vegere malê û te kengî xwest were cem me.
Di kêlîkekê de gor, mîna şikeftên biçûçik, tev de vebûn . Bi dû windabûna miriyan de, gor
vegeriyan rengê xwe yê berê. Şêxo zîvirî, çavên wî ketin herdu çavên bavê wî yên mişt av. Lawir
mat mabû, serê xwe ji Şêxo re hejand û çû. Li male xwêdanek Şêxo diçû, yek dihat. Diya wî,
mîna mûmekê, dadiwerivî. Rojê hinek goşt jê kêm dibû. Piştî hefteyekê Şêxo bûbû benîştê devê
xelkê. Şêxo bi xwe re dipeyive. Nîvê şevê bi tenê diçe Şermola. Bûye hevalê miriyan, dibêje ku
wan dibîne û zane bi zimanê wan:
- Ha ha ha ha, jixwe ew ji dînan kêm maye.
Rewşa diya wî dijwartir dibû, xwarin kêm dixwar û nalîna wê bû:

- Axx.. pişta min dêşe... Pişta min.
Hate bîra wî ku malbata wan tev de bi êşa piştê çûne gorê. Heryekî bigota pişta min, dizanîbûn ku
mirina wî nêzîk bûye. Xweşik, bala xwe da diya xwe. Tirsiya ku ew jî di rengê lawiran keve. Lê
her bi her gewdeyê diya wî biçûçiktir dibû. Pûrteke sipî li çermê wê peyda dibû. Pûrt dirêjtir û
hişktir dibû. Şêxo li nav hev ketibû. Ti kesî nizanîbû çi pê hatiye. Her şev diçû cem bavê xwe. Li
kêleka mezel radiwestiya. Ew lawir hêdî hêdî ji pişt girê Şermola derdiket, li ser teriya xwe
rûdinişt û li Şêxo guhdarî dikir:
- Yabo ev çi li dora min dibe? Ez nema tiştekî ji hev derdixim.
Çermê lawir piçik piçik diçiriya. Şêxo dilerizî. Ji nişkê ve bavê wî li cem rûnişt. Çermê xwe kir
wekî kurk û avêt ser pişta xwe:
- Lawo metirse, em mirî ji van zindiyan çêtir in. Rewşa me xweştir e. Dawet, kêf, dîlan,
şevbuhêrkên ku ti carî min nedîtibûn, ez li vir dibînim.
- Yabo ez jî dixwazim bimirim.
- Na, temen di destê Xwedê de ye. Lê min bêriya diya te kiriye. Lawo wê qiriktalê, ti xweşî di
jiyana xwe de nedît.
- Diya min nexweş e.
- Ez zanim, wê di demeke nêzîk de bê cem min.
- Yabo ez bûme wekî dînan. Xelk tev de wilo dibêjin.
- Xem nake lawê min, ev tişt ji bo te baş e. Sibe wê hevalê te jî çê bibin.

Xiştexişta lingekî hat. Şêxo ji dûr ve mêrek dît. Bavê wî keniya û rabû ser xwe:
- Hemdînê serxweş e, her şev tê serê xwe datîne ser gora Zeyno û digirî, jinik jî tim li nav
miriyan henekê xwe pê dike. Tê, her şev hinekî ji erda cem gora wê dikole û dibêje; ev gora min
e. Dixwaze piştî ku bimre jî, li kêleka wê be. Ev dil çi mirov şerpeze û bêrûmet dike lo.
Şêxo ketibû nav Leylanê. Lê bavê wî ew şiyar kir:
- Ya Xwedê, serxweşê me nêzîk bû.

Hema çermê bavê wî lê hate hev û li ser piyan beziya. Şêxo tenê ma, ji bîr kir ji bavê xwe
bixwaze ku êdî wî di xew de , nema bixwe. Hemdînê serxweş nêzîk bû:
- Merheba Şêxo, tu çawayî lo? Te Zeyno nas dikir?.. Zeynebê... ihî... ihî... ihî...
Giriya.
Zeynebê berî çend salan bi nav û deng bû. Hem bi xweşikbûna xwe, hem jî bi hildana herdu
lingên xwe. Zeyno jinek ji agir û berfê bû. Xwediya gewdeyekî sipî û lihevhatî û wîneke germ.
Dilbijokî ji çavê wê diherikî. Lêvên wê bang li mirov dikirin. Herdu çiçikên girover di bin
gumlekê rengînî de birûsk vedidan, agir ji wan diçû. Xortê ku lê dinêrî, kef bi ser devê wî diket.
Ev xortên ku ji pêvî dê û xwişkên xwe ti jin nedîtine. Zeyno dilê gelekan dizî bû. Her êvar

rûpelek bi navê wan dadigirt û her roj zencîra navan dirêjtir dibû. Bavê wê miribû. Birayê wê,
piştî pola nehan, ew ji dibistanê derxistibû. Destpêkê newêrîbû xwe bida dest ti kesî. Evîndarên
xwe tev de girêdayî dihiştin, lê di heman demê de, ew dûr jî dihiştin. Di dawiyê de, xwîngermiyê
zora wê bir û kete nav ramanin qedexe. Mîratên şevên Amûdê dirêj in û rojên wê hîn dirêjtir in.
Tiştekî agirî di nav ling û memik û lêv û por û pişta wê de, ew dişewitand. Kezeb lê zuha dikir.
-Ji pêvî Smaîlo kes tuneye.
Smaîlo dîne û nizane ji kesî re bêje. `Ew çi bibêje, kes jê bawer nake. Mal tev de, ji bo xwarinê, li
ber vekirine. Rojekê Îsmaîlo, birçî, hat. Zeyno tenê li mal bû. Ew têr xwarin kir:
- Zeyno ka çayê?
- Smaîlo were vê odê, çayê vexwe.
Zeyno li cem Smaîlo rûnişt. Bi destê xwe qedeha çayê da wî. Wî jî, bi henekî, dev li destê wê kir.
Zeyno ew li erdê dirêj kir. Destê xwe daxist berjêr. Derpiyê wî daxist û tiştekî qalind û dirêj di
nav destê Zeynebê yê germ û agirî de, kef da. Zeyno ew mijand, ew alast, dihat ku wî bixwe.
Herdu çiçikên xwe lê pêçan û di nav ahînê de cilên xwe tev de belawela kirin. Li ser Smaîlo
rûnişt, ew jî ditirsiya ku canê wê di devê wê re derkeve. Bi hildan û daxistinê re, Smaîlo ji şewata

xweşiyê bi herdu destan bi porê xwe digirt û dikişand. Rûyê Zeyno jî di nav biskên belavbûyî de
winda bûbû. Herdu lempeyên tijî şîr, di nav destên wî de, şikestin. Govenda dînbûn û xweşiyê bû.
Heta qîjîniya cewrikekî birîndar ji Smaîlo derket. Zeyneba tazî, bi ser piştê de, li erdê rast bû.
Smaîlo dikeniya, Zeyneb digiriya û xwîn ji ser herdu rahnên wî paqij dikir. Smaîlo derpî kişand
xwe. Bû çerpeçerpa devê wî.
- Eeeeeh.. Çi xweş bû.
Derket. Dîsa mewalê xwe berdewam kir. “Ez birçîîîî me.” Zeyno çend rojan xuya nekir. Pişt re,
her ji sê rojan, di hemêza mêrekî de, agir ji xwe dadiweşand. Li gelek xortan xweşî û agir û
merezî û xweşikbûn û şahî belav dikir. Di ber re jî çendên din di nav arê evîna xwe de disotin.
Yek ji wan Hemdînê bextreş bû. Ji dil û can xwe dabû evîna Zeyno. Wê jî carekê tenê hişt ku di
derya ya xweşiya wê de avjeniyê bike. Zeyno nema di ber pêlên ava mêran re gihişt, avis bû. Nû
bira pê hisiyabû, du rê li pêşiya wê vebûn:
- Kuştin, an zewaca bi bavê vî lawikê ku hîn di zikê wê de ye.
Zeyno Hemdîno kir bav jê re. Ji ber ku ti kes jê pepûktir
Nedît. Wî jî çav û guhên xwe ji zimanê xelkê girtin û ew xwest û ew “revand” bajarekî din. Lê
her ku Hemdîno ji kar vedigeriya, ev pirs jê dikir:
- Zeyneb, kî li vir bû?
-Ezê bi şev ji te re bêjim.

Bi şev Hemdîno, di nav pêlên lêv û bisk û memik û goştekî ji berfê spîtir de, hiş winda dikir.
Pêlin ji gulan bibêhntir û ji agir jî germtir bûn. Xwe winda dikir. Xwe û kalik kalikên xwe dida
ber bahoza xweşiya Zeyno:
- Hevalekî birayê min bû lo Hemdînoo, ay, ay, ay.
Bi ahîna wê re Hemdîno dibû ba. Dibû tayekî zirav ji tunebûnê. Hetanî ku nav û dengê Zeyno,
birayê wê, wekî mar, ji qulê derxe:

- Hemdîno ez gotineke din li ser jina te bibihîzim, tu wê nekujî, ezê te û wê herduyan bikujim.
Hemdîno çend rojan Zeyno xistibû bin çavan. Zeyno mal kiribû doşeka rêwiyan. Hêrsekê bi nava
wî girtibû. Di wan kêlîkan de, hêrsa wî, mîna mayîneke nedîtî, teqiya. Jina wî, tazî di nav cihê wî
de, bi yekî din re bû. Ji ber ku demança wî tunebû, beziya kêrê. Mêrik reviya. Gava kêr li Zeyno
bilind kir, du tîrêjên ji agir ji çavên wê yên xweşik berfa hinavên Hemdîno, bi carekê, qelaştin.
Destê wî lerizî. Kêr li erdê ket. Giriyekî reş Hemdîno zeft kiribû. Ne karîbû wê bikuje, ne jî
karîbû bê wê bijî. Gotinên xelkê li ser şan û namûsê û... tev de di nîvê şevê de di nav agirê goştê
Zeynebê yê sipî de dibû dûman û arî. Rojekê ji kar vegeriya, jina kuştî li ser text dît. Birayê wê ev
hevok jê re nivîsîbû:

“Hemdîno, Ji ber ku tu ne mêrî, min bi destê xwe, navê malbata xwe ji vê şermê paqij kir.”
Ji wê rojê ve Hemdîno serxweşe. Ti kesî ji xelkê neda dû laşê Zeynebê, wî bixwe ew veşart. Her
şev dihat li ser gora wê, çixareyek ji “giyakê bihuştê”, heşîş, wilo nav lêkiriye, vedixwar û du sê
şûşe dişkenandin û di ber hemû cîhanê de, digiriya:
- Ez di ber evîndarên dinyayê de digirîm. Eger ez mirim, min li kêleka Zeyno veşêrin. Ez
Memoyê sedsala bîstan im.
Şêxo bi destê Hemdîno girt, ew gihand cem gora Zeyno û vegeriya mal. Serê Smaîlo xuya kir.
Hemdîno qîr kirê:
- Smaîlo we re qedehekê vexwe, were.
Smaîlo lê vegerand:
- Kurro hûn vedixwin ji bo hûn bibin wek min. Ma ez vexwim ezê bibim wek kê?
Li malê nalenala diya Şêxo bû:
- Pişta min çû lawo, pişta min.
Diya wî bûbû mîna zarokeke biçûk. Pûrtê laşê wê veşartîbû. Şêxo derket devê derî û xwest ku
çareyekê bibîne. Bû pirtepirta baskên diya wî û firiya. Qirak di ber serê wî re firiya û bi ezmanan
ket. Şêxo behetî mabû, wisa jî diya wî, mîna mêşeke reş li ezmanekî fireh û sayî, xuyanî dikir.
Bavê wî bû lawir. Diya wî bû qirak. Gelo wê ew bibe çi?
Kete nav ava ramanin kûr. Zîqezîq ji diranê wî hat û dest bi cûtina gumlekê xwe kir. Jiyana xwe

dicût, temenê xwe dicût. Cîhan tev de, di nav diranên wî de, bû paçikekî cûtî. Li kolanan zarok lê
diciviyan û li çepikan dixistin:
- Dîno dîno kirasê xwe diqetîno.
Xelkê nizanîbû çi bi diya wî hatiye. Hinekan digot:
-Ji mal reviyaye.
- Bi çolan ketiye.
- Da dû bav, dê li ser kir.
Şêxo, geh li Şermola bû ji xwe re pêkenok li ser zindiyan digotin û dikeniyan, geh jî bi dînan re
dema xwe derbas dikir. Şêxo dînên mirî û yên sax hemû li hev civandin. Dînan, bi zimanê xwe yê
taybet, li hevdû dipirsî. Li ser hev dixeyidîn heta û hevdu diparastin. Hîndero biryara sazkirina
komarekê da. Bi hilkişandina wî ya ser girê Şermola re, biryara avakirina komarê hate
eşkerekirin. Pê re jî dengê kevir û dar û zarokan li erd û ezman belav bû:
- Dîno dîno kirasê xwe diqetîno.
Komara Dînan

Endamên komarê:
1- Hîndero
2- Smaîlo
3- Şêxo
4- Xalibo
5- Newafo
6- Xelefo
7- Hecî Hemo

8- Şêrbello
9- Ehmed
10-Xanimê
11-Selaho
12-Izzo
Artêşa komarê:
Mamûn + Mencolê + Bavê Babil + Azado
Gava ku Hîndero û Smaîlo li hevdu rûniştibûn, ro diçû ava:
- Lawo Smaîlo, me di saxiya xwe de li hev nedikir. De, ka em di mirina xwe de bibin dost.
Smaîlo bikêf lê vegerand:
- Em çiqas bêhiş bûn lo, tê bîra te?
Dîn tev de li razîkirina Hîndero digeriyan, ji ber ku bersivên pirsên tevan li cem wî hebûn.
Zanîbûn ku xwendina zêde û siyaset bi dû dînbûna wî de bûn. Gora wî, heta wê gavê, mişt pirtûk
û kovar û rojname bûn. Di civînên dînan de, tim ji Şêxo re digot:
- Lawo Şêxo, eger pişta me heba, ma niha rewşa me wilo ba? Ma nayê bîra te kalik û bavê te bi
êşa piştê çûn. Dînino, delalno, kalik û bavên me, wek me û niha, bêpişt bûn. Lê ji niha û pê ve,
divê em bi kêrî xwe bên.
Biken li Smaîlo zîvirî:
- Tu zanî zindî bi te dikenin.
- Çii.. bi Xwedê ez ji wan çêtir bûm, çi dibêjin?
- Dibêjin havînekê baran pir hat û nema sekinî. Smaîlo jî digot ku ev baran di destê yekî bi aqil de
ba, wê têra me û deh salan bikira.

- Yabo ma ne xebera mine?
- Smaîlo.. tu hîn li ser a xwe yî?
- Na, ez li tiştina poşman bûme. Wek xeyda mina ji Amûdê. (Demekê Hîndero û Smaîlo bajarê
Amûdê li hevdu parkirin. Ji çem û ber bi rojava ve perçe yê Hîndero bû. Ji çem û ber bi rojhilat
ve perçe yê Smaîlo bû. Rojekê Hîndero bi şaşî derbas bû aliyê rojhilat. Hema Smaîlo yek nekir
dido, rahişt kêrekê û li nav milên Hîndero xist. Xelk bi wan ve hatin. Hîndero derman kirin û ew
li hev anîn. Lê, divê Smaîlo pêncî diravî bide wî. Smaîlo bi alîkariya Sofî Mihemedê Eyşanê "Yê
ku her în çakêtê xwe li mizgefta mezin radixe û peran ji yên hejar re, dide hev. Vê carê pere ji
Smaîlo re kom dikir:
- Lawo bila xêra we be, xwînek ketiye stûyê min.
Piştî pêncî diravê ku Hîndero dayê, rahişt tûrikê xwe û pişta xwe da Amûdê:
- Bi Xwedê, du dîn di bajarekî de nabin.
Herdu dikeniyan:
- Maf bi xelkê re hebû bi me dikeniyan. Smaîlo guhê xwe bide min. "22" çilleyê paşîn nêzîk dibe.
Divê em tiştekî girîng li Şermola bikin. Tiştekî wisa ku me, di jiyana xwe de, nikarîbû bikin.
Tevgereke fireh di nav dînan de peyda bû. Miriyan nizanîbûn bê çi bûye. Hîndero ew dicivandin.
Bi roj û şev ew û Smaîlo dipeyivîn û dikirin pistepist. Carinan deng bilind dibû, lê ka yê ku

zanibe bê dîn çi dixwazin. Şêxo çar lempe anîn û di girê Şermola de veşartin. Hîndero û Smaîlo û

Newafo mezel kiribûn kewara mêşan. Şeva “21”ê çilleyê paşîn, Hîndero bang li Şêxo kir:
- Kanî çirayên ku min ew ji te xwestin?
- Serokê min, min lempe anîn.
Bi lez û bez, her çar lempe dane dest.
- Kanî kevirekî mezin?
Kevir jê re anîn.
- Yek.
Lempe şikand.
- Dido.. Sisê.. Çar.
Her çar lempe kirin ard.
- Şêxo! Lempe lempe ye û çira çira ye. Sibe divê çar çira di nav destên min de bin.
Dîn, her yek bi aliyekî ve terqiya.
Roja din çar çira li kêleka Şermola şewq didan. Hîndero, mirî tev de civandin. Li hêviya
fermanên wî bûn. Hilkişiya ser gir. Selaho, nivîskarê wî, da dû. Destên wî mişt pel û rojname
bûn. Hîndero, bi dengekî qube û bi seriyekî bilind, dest pê kir.
Miriyên hêja,
Hevalên delal,
Îro bîst û duduyê çilleyê paşîne. Divê careke din, di dîrokê de, ev roj bibe destpêka rojeke nû. Vê
care, divê gava me sererast be û heta hetayê berdewam bike û şikestinê nebîne. Ez niha li vê

meydanê û li ber çar çiran, avakirina komara dînan eşkere dikim.
Çepik bilind bûn. Miriyên ku di goran de mabûn bi qêrînê veciniqîn.
Bijî komara dînan!
Bijî azadî!
Miriyan, hestiyên xwe ber bi rûyê ezmanekî çavpêl û zuha ve bilind dikirin . Qêrîn dibû piçik û
parî. Deng ji hinek miriyan hat:
- Divê ev komar ya miriyan tev da be.
Hîndero di cih de bersiv da:
- Deriyên vê komarê ji miriyên hêjayî tenê re, vekirîne. Ne her yek ji ramanên me razî ye. Eger
mirov ne dîn be yan bi kêmanî hinek dînbûn pê re nebe, nikare têkeve bin sîka komara me.
- Bijî komara dînan!
- Emê niha navên wezîr û berpirsiyarên komarê xuya bikin. Kerem bike hevalê Hawar! (Newafo)
Newafo bi cilên xwe yên leşkerî û bi stêrk û nîşanên xwe li ser girê Şermola sekinî. Navên
wezîran hejmartin.
1- Hîndero - Serokkomar
2- Smaîlo - Wezîrê Xwarinê
3- Şêxo - Wezîrê Şer û Pevçûnê
4- Xalibo - Wezîrê Dadmendiyê
5- Newafo - Serokê Artêşê û Hêzên Şer
6- Xelefo - Wezîrê Aboriyê
7- Hecî Hemo - Wezîrê Oldariyê
8- Şêrbello - Wezîrê Rev û Koçkirinê
9- Beşîro - Wezîrê Çixare û Keçikên Dibistanê

10- Xanimê - Wezîra Karê Jinan
11- Selaho - Nivîskarê Serok û Wezîrê Çap û Weşanê
12- Izzo - Wezîrê Avahiyê (Avakirina Gor û Malan) Newafo ji wê rojê ve bû Hawar. Sipasiyên
xwe li mirî û haziran belav kirin. Zîvirî, silaveke leşkerî li Hîndero re kir. Daket, Hîndero
berdewam kir:
- Erê mirîno, hevalno!

Damezrandina komara me, divê ji hemû dîn û miriyên dinyayê re, bibe nimûne . Karê xwe xurttir
bikin. Komarê bi hezkirin û hevaltiyê bixemilînin, ji ber ku ev komar ne weke yên zindiyane. Ev
komar ne ya mirovên sax û mirî tenê ye. Ya giya û gul û dar û kimorî û teyr û lawirane jî.
Komareke gerdûnî ye. Wekî çavên xwe, lê miqatebin. Hûn tev de dizanin, ku ji hezar salan ve em
bêpişt in. Ez ji Xwedayê mezin hêvî dikim ku ji me re bibe pişt. Yê ku Xweda li pişta wî be,
ketina wî nîn e.
Bijî dînbûn, bijî komara me!
Dînan, heta ew gihandin gora wî, Hîndero li ser destên xwe kirin.
Govend û dawetên miriyan heft roj û heft şevan berdewam kirin. Piştî wê, her yek vegeriya karê
xwe. Jiyana wan a nû bi wan xweştir dihat. Lê her roj zindiyan çarçira didizîn. Newafo ferman
gihand artêşê; herçî ku çirayên me bidize divê bimre. Bi dehan zarok û parsek û mêr hatin kuştin.

Serok ferman da Şêxo, Wezîrê Şer û Pevçûnê, da ku çarçirayan bîne, lê divê mirî tenê wan
bibînin. Ji ber vê, divê mirî bixwe wan çirayan çêbikin. Ji ber ku mirî gelek destgirtî û dilreş bûn,
şer û pevçûn derdiketin. Şêxo rê li ber dizên zindî girt. Zindiyan, ji pêvî axa Şermola, nema
karîbûn tiştek bidiziyana. Nîvê şevê dihatin axa reş didizîn û direviyan. Heta ferman gihişt kimorî
û dûpişkan, da ku axa Şermola biparêzin. Kî dihat diziyê, mar yan dûpişk pê vedida. Li nav
xelkên zindî ev bawerî belav bû; “Axa Şermola tijî mar û dûpişk in.” Nema wêrîbûn ax
bidiziyana.
Zindî wisane... tirsonek in.
Hîndero ferman li dû fermanê belav dikir. Selaho çapxane zêde dikirin. Nema kesek ji kesekî din
re vala bû.
“Divê her tişt li nav me eşkere bibe. Ya giring ewe, ku tiştek bidizî û veşartî nemîne. Ez bi hêvî
me, hûn me nekin wek dewletên zindiyan, ku em xelkê tev de bikin guh û guhan biçînin. Di her
malê de ev rewşa hebû. Her yek yê din ji bo diravekî bikuje û bira bira bifiroşe. Ev rewşa
zindiyane, ne ya me ye. Ji ber vê jî divê dîn ji hemû miriyan re bibin nimûne. Bawer bikin ku
Xwedê pirr ji me hez dike, ji ber vê em dîn kirine. Dînbûn hezkirineke xwedayî ye. Bi dest

herkesî nakeve. Bi sedan, li dora we zindiyan rewşenbîr û zane hene, ku dixwazin dîn bibin, lê bi
destê wan nakeve. Xwedê êş daye wan û jîrbûn daye me. Li gor vî barîbin û komara xwe ji nezan
û zindiyên çavsor û miriyên zikreş biparêzin.
SELAHO
Selaho, her sibe, bi kolanan diket û her êvar vedigeriya Şermola, ji bo daxuyaniyên din biweşîne.
Bi sedan rojname difirotin. Destpêkê mirî û zindiyan dixwendin. Lê roj bi roj xwendevan kêm
dibûn. Nemaze di nav zindiyan de. Pirtûk û rojname û kovar, nema dihatin xwendin. Xelk bixwe
daketibûn. Henekê xwe bi xwendevanên rojname û kovaran dikirin. Zindiyan nema diravek tenê
didan bi rojname û pirtûkên cîhanê tev de. Piçika hişê Selaho yê mayî jî firiya. Berê her ku wê
deriyê serşokê li xwe bigirta, birayê wî yê mezin derî lê vedikir. Li laşê wî yê tazî dinêrî:
- Te sabûn û av bi me ve nehişt.
Selaho tazî derdiket kolanan. Dibeziya û bang dikir:
- Birayê min berra min da.
Tazî li kolanan dikir sema!
- Birayê min berra min da.
Piçûkanî bavê wî jê dixwest bixwîne. Pirtûkên xwe kom dikirin. Datanîn ser serê xwe û ji bavê
xwe re digot:
- Ka çawa evqas pirtûk wê têkevin vî serê biçûçik?.

Niha Selaho wezîre. Wezîrekî ji pelên rojnama ye. Dema radiweste, rojnameyên xwe ji xwe re
dike balîf û dikeve xewê. Carinan doşekê bi pirtûk û kovaran çêdike. Xwe li ser dirêj dike. Yan jî
wan dike xwarina agir. Rojname di bêrîkên wî de bûn, di paşila wî de bûn, di bin çengê wî de

bûn. Nûçeyên balkêş tenê dixwîne:
* Îro... yekî dergîsiya xwe ji qata şeşan avêt û xwe jî bi ser de kuşt.
* Îro.. fermanin nû. Rewşa komarê. Bîranînên miriyan.
* Îro.. zindiyan laşên çar miriyan dizîn û pênc gor vekirî hatin dîtin.
* Îro.. dinya, mirî, xelk, zindî, kuştin, ken, girtin, kirîn, firotin, ceng, wê qiyamet rabe, qiyamet.
Werin rojnameyên îro bixwînin.
Carinan jî wezîrê weşanê birçî dibû, ji ber ku ti kesî li welatê wî nedixwend, li ber rojnameyên
xwe rûdinişt û yeko yeko ew dixwarin.
HECÎ HEMO
Jêhatî bû, lê wirr bû, çav çewt bû. Di xortaniya xwe de, berî dest bi firotina goşt bike, karê wî
zewac bû. Pênc, şeş jin anîn. Her wê biba xwedî jin, bi dû heft rojan de, dema xwediyên jinê
dihatin cem, ji bavê jina xwe re digot:
- Qîza xwe jî bi xwe re bibe û venegere.
Bav vediciniqî û têdigihişt ku qîza wî ne qîz derketiye. Divê bê kuştin, an jî divê ev şerma reş
nekeve devê xelkê. Hemo jî gotinên xwe jiber kiribûn:
-Ji ber ku hûn meriv in, emê jî vê şermê veşêrin.

Carek, dido, çar û pênc, nema kesî qîza xwe didayê. Heta çû jinek ji Nisêbînê xwest. Piştî zewacê
bi heft rojan, bavê wê jî hat. Di wê demê de, her çendî dereng bû jî, her tişt li ser Hemo
bihîstibûn. Ji ber vê, dema Hemo dest bi gotina xwe kir:
-Ji ber ku hûn meriv in, emê vê şermê veşê...
Heft fîşekan xwîn bi ser dest û lingê wî de herikandin û bû hewar hewara wî. Ti kesî nizanîbû ku
ev fîşek dermanê wî bûn û berê wî dan hecê. Xelkê çîrokên wî ji bîr kiribûn. Rojekê xwişka xwe,
di nav leman de, bi yekî re dît. Bi dû de beziya. Ket, westiya û tişt bisernexist. Xelkê digot:
- Mêrik ber bi bakur ve direviya, Hemo jî ber bi rohilat ve ketibû pey wî. Dema tişt ji leman fêde
nekir, vegeriya û dest bi xwarina leman kir. Piştî wê, xwişka xwe tazî bi yekî re, di malê de, girt.
Lawik cilê xwe hiştin û beziya. Mîna kuliyekî xwe avêt derve. Yekser ew nas kir. Hema rahişt
cilên wî û çû cem bavê wî:
- Yan tê bê keçika me niha bixwazî, yan emê hevdû bikujin.
Xwişka wî zewicî. Hemoyê çavçewt gazinek tenê ji zava kir:
- Lawo tu bi dizî hatibûyî cem xwişka min, xem nake, lê te çima hevalê xwe bi xwe re anîbû.
Zavê lê vegerand:
-Jixwe bipirse bê çima çavê te sisê ne.
Hemoyê bi sêçavan, bû Hecî Hemo. Ji dil û can dest bi karê xwe kir. Hemo çiqasî bi firotina goşt

û çandiniyê zengîn bû, ewqas bira û bavê wî jî di bin deynan de mabûn. Ji ber ku Hemo pere tev
de di ber birayên xwe û bavê xwe de dan, wan jî bi qumarê hemû tar û mar kirin. Ev gotin li nav
xelkê belav bû:
- Hecî Hemo dîne.. dîne.
Salekê mûsim nehat. Baran tune bû. Xelk dihalin ku hevdu bixwin. Rewşa Hecî Hemo xerab bû.
Bira û bav bi hev re jê direviyan. Pereyên ku mabûn jî tev de kirin mengena goşt û vî hesinê
bêcan ew pere cûtin. Kirin piçik û parî. Ji wê rojê ve Hecî Hemo dînbûna xwe eşkere kir. Derket
kolanan. Di nîvê rê de rûnişt û ji nişkê ve bang kir:
- Ya reb, ya reb tu me biparêzî. Bav li law siwar tê. Bira li bav siwar tê. Govenda pera ye. Bira li
bira siwar tê. Siwarên yabo siwarên, tev de li hev siwar bin. Dinya bûye siwarbûn û ya reb.. ya
qeyûm.
Bi dengekî zelal û xemgîn dest bi stirana xwe kir.
Lo lo siwaro

Rêka min dûr e
Ez bê heval im
Derdê min kûr e
Hesret giran e
Derdê dilan e
Bêkeso dilo
Tim êş û jan e

Lo lo siwaro
Ji min nepirse
Dilê min î jar
Gelek bi tirs e
Ditirsim bimirim
Ez bi hesretê
Dinyayê nema
Sebram li te tê
Baranê dest pê kir. Mirî bi dengê Hecî Hemo re serxweş dibûn. Gotinên wî di civatan de gelekî
kêm bûn. Lê gava dipeyivî gotinin ku êş ji wan diweşiya digotin.
- Erê birano. Erê ez di nav we de me, bi we re dikenim, bi we re digirîm, lê ez bi tenê me, tenê
me. Ne li dinyayekê tenê belê li herdu dinyayan.
Dîsa dest bi ahîna xwe ya bişewat kir:
Ax, heta ez hebim ax
Xwedêyo ezê çi bikim
Ji van birînên kambax
Bi dû vê stiranê re, serê xwe danî ser kêla gorekê û giriya. Heta nema deng jê hat. Mizgeftên
biçûçik bi axa Şermola ava dikirin. Dûv re xera dikirin.
Heriya mizgeftê dikir gilok û dixwar. Herî dixwar, dilê wî dihat ku di devê wî re derkeve. Niha
bû wezîrê oldariyê. Mizgeftek mezin ava kir û kursiyek danî ber derî. Li ser rûnişt û rahişt
tivingê:
- Ev mala Xwedê ye. Çênabe ti kes derbas be hundir.
- Emê nimêj kin.

- Herin mizgeftin din. Herin mal!
Tenê diket hundirê mizgeftê. Ji xwe re distira û ji pêvî Xwedayê mezin, nema êşên xwe li ber ti
kesî radixistin :
Xwedêyo bitenê me
Xwedêyo çav li rê me
Nizanim li hêviya kê me
Tenê zanim ez tenê me
Digiriya, her ku dest bi stiranan dikir, ezman jî dest bi hêsiran dikir û baran dibariya. Izzo jê re
malek ji tenekeyan çêkir. Karê wî mabû komkirina teneke û textikan. Tim teneke di destê wî de
bû.
Her ku mêrek yan jinek didît û nediket serê wî, nêzîkayî lê dikir û teneke di serî de dipelixand û
direviya. Mirî û zindî tev de ji tenekeyên Izzo ditirsiyan.
IZZO
Kurdunde bû. Jina wî miribû. Bêkes bû, tu kesî nizanibû bê ji ku hatiye, yan ji kîjan êlê ye.
Destekî wî jêkirî bû. Gelekî bihêz bû. Tev de jê ditirsiyan. Riha xwe her ji mehekê carekê kurr
dikir. Porgijik bû. Girrê xwe di her kesî dida:

- Xwedê kir, ku tu bi destekî tenê yî.
Gava mêrek zeft dikir, bi destê saxlem bi qepera wî digirt û bi destê jêkirî ew wek mîxekî di erdê
de dikuta. Bi kulman li serê wî dixist, heta ew direviya yan rûdinişt. Tenekeyên vala li kolanan

nehiştin. Tev de dan hev û xaniyek ji tenekeyan li hewşa dibistanê ava kir. Ne berpirsiyar, ne jî
mamosteyan, ti kesî newêrîbû nêzîkayî li mala wî bike. Eger derî li xwe bigirta, ti hêzê nikarîbû
wî derî lê veke. Xaniyê wî bûbû cihê matmayînê. Çawa teneke ewqasî xwe bihev digrin?. Xelkê
bersiv da:
- Tenekeyên mişt zêr li ba wî hene.
Mîna agirekî ku bahoz wî li qirşikan belav bike, ev xeber belav bû. Izzo di zivistanê de li hundirê
xwe radiket. Havînan, ji ber ku hundir germ bû, li salona dibistanê radiket. Tevî ku ti pencere tê
de tunebûn.
Bi dehên caran diz dihatin ku deriyê wî bişkînin, da tenekeyên zêr bibin, lê derî, carekê tenê jî
venebû. Rojekê serê sibê, li ber devê deriyê wî, xelkê Izzo kuştî dît. Hinek mû di nav tiliyên wî
de bûn. Xuya bû gelekî li ber xwe dabû. Berî bi kêran bê kuştin, agir berdabûn mala wî, lê tiştek
neşewitîbû. Newafo berî her kesî pê ve hat. Newafo yê hergav, ji ber tirsa Izzo derpiyê wî şil bû,
berî her kesî bi hewara wî ve hatibû. Gotinên xwe yên her gav dubare dikirin:
- Dîno dîno derpî şîno.
Her carê Izzo lêxistineke germ û nerm li Newafo dikir. Heta derpî şil dikir. Xelk li laşê wî
civiyan, lê ti kesî mûyên di nav tiliyên Izzo de nas nekir:
- Reşikê şevê ew kuştiye.

Dema Şêxo bihîst perçe ji xwe kirin:
- Ev mû ne mûyên reşikê şevê ne. Ev mû mûyên seriyên mirovin zindî ne: Bêhna zêr hişt ku ji nişkê ve, hinek li Izzoyê mirî xwedî derkevin. Wê çaxê hikumetê dest danîbû
ser tenekeyên zêr. Xwediyên Izzo poşman bibûn ku xwe eşkere kirin. Lê niha serên xwe pê bilind
dikin. Tê mal û gorên wan ji wan re ava dike. Gelek gorên ji teneke û textan çêkirin. Bi reşikê
şevê re bibû dost. Herduyan mirovên bizdok ditirsandin. Carinan Izzo tenê diçe wan:
- Te çi kir jê?
- Min ew ziravqetandî kir. Min ew qutifand. Min nizanîbû ku zindî wilo ji miriyan ditirsin.
HÎNDERO
Hîn biçûçik bû, pirtûkên dîrokî û siyasî dixwendin. Bû endamê partiyeke mezin. Ji dil û can kar
dikir. ji nişkê ve partiya wî bû du partî. Nema zanîbû bê têkeve rêza kîjan aliyî. Demekê wilo ma.
Dûv re tevlî partiyê bû. Dîsa perçe bû. Bi şev û roj digotin; “Yekîtî... yekîtî” û bi şev û roj perçe
zêdetir dibûn. Nema karîbû navên wan bijmêre. Vê dawiyê têgihîşt ku ew bixwe partiyeke
serbixwe ye. Demekê windayî ma, pişt re wî bixwe jî dest bi perçebûnê kir. Her perçeyek ji laşê
wî bû partiyek. Qerebalix û xirecir kete laş û canê wî. Nema tiştek ji hevdu derdixist. Destê çepê
radibû yê rastê. Her tiliyekê seriyek dikişand. Laşê wî bû kewara raman û mêşan. Di vê xeleka

vala de Hîndero hiş winda kir.
Berê li serxwebûnê digeriya, niha li hişê xwe digere. Li xwe digere. Tim digot; min ev komar ava
kir, ji bo em xwe bibînin. Nû têgihiştin, digotin erê. Lê, ti kesî nizanîbû Hîndero çê dibêje.
XALIBO
Xalibo radihişt çi tiştî, dizanîbû ku ew tişt çend kîlo ye, yan çend giram e. Ji ber vê ti carî bêkar

nedima. Xalibo mêzên bû. Li cem xwediyê, goşt, mêwe, dendik û sêvan kar dikir. Li şûna mêzênê
radiwestiya. Kê çend kîlo bixwestana, dida wan. Destê wî mêzên bû. Li cem ti kesî berdewam
nedikir. Ji ber ku her ji saetekê, ji nişkê ve, winda dibû:
- Tu li ku bûyî?
- Ez çûm cihekî û ez hatim.
- Careke din wilo neke ha!
- Erê... erê!
Carekê goştfiroş da dû. Dît ku li qorzîkekê Xalibo destê xwe dirêjî "tiştê" xwe kiriye û ahîn
pêketiye. Goştfiroş deng nekir. Lê dema dît ku Xalibo ev kirin ji xwe re kiriye kar û ti qorzîk ji
bazarê zuha bernedaye, çû ji diya wî re got:
-Jinekê ji lawê xwe re bîn, çêtir e. Bi Xwedê, lehî li wan qorzîkan rakiriye. Diya wî jinek nîvdîn
jê re anî. Tev ku Xalibo di çûn û hatinê de digot:"Min navê.", lê dîsa jî diya jin jê re anî:
- Lawo emê jinê ji te re bînin, belkî tu aqilekî ji xwe re bigrî.

Di şeva zewaca xwe de terqiya. Bi çolan ket. Piştî çend rojan ew nîv sax nîv mirî, di qorzîkeke
reş de, dîtin. Li malê karê wî mabû dagirtina avê.
Firax tev de dadigirtin. Diya wî dikir ku biteqe. Berê xwe ber bi jor ve dikir:
- Xwedê bavê te ji Şermola vegerîne.
Piştî ku bû wezîrê dadmendiyê dest ji firaxan berda, karê wî mabû çêkirina mêzênan. Mêzên bê
pere li xelkê belav dikirin. Her carê bang Selaho dikir:
- Kanî ez pirtûkên te li mêzênê kim.
Aliyekî mêzênê tijî pirtûk û kovar û rojname dikirin û aliyê din vala dihişt.
- Selaho... kanî sola xwe bide min.
Sola Selaho ya kevin û şimikek, ji pirtûk û rojnameyên wî girantir bûn. Selaho matmayî li Xalibo
dinêrî:
- Çawa evqas pirtûkên giran ji sola min siviktir in.
Xalibo bihêrs devê wî digirt:
- Hiş kurro.. ev îşê Xwedê ye.
Bavê min tim digot; ji hezarê salan ve ye, ku sol ji pirtûkan girantir in. Ez mêzên im û ez
dizanim.
AZADO
Şêwekar bû. Hunermendekî destsivik û jîr bû. Ji gava ku bîr biriye, cîhana wî, şev û roja wî, reng
û tablo bûn. Tiştek li dora wî nema, ku bi rengên wêneyên wan di tabloyên xwe de saznekirine.
Di şevên dirêj de, di nav rengan de, ceng û şerên giran birêvedibirin. Diya wî nema karîbû ev
rewş bipejiranda:

- Lawo bi Xwedê tê dîn bibî ha.
Xwarina wî kêm bûbû. Hevalên wî jê dûr diketin. Wî jî xwe di dojeha rengan de dişewitand:
- Ezê wêneyê Xwedê çêkim.
Di ber muzîka kilasîk re, firça wî ranediwestiya. Bach, Beethoven, Mozart û Chopen tev de pê re
di odê de diliviyan:
- Divê ez Xwedê resim bikim.
Derdiket kolanan. Gava dimeşiya serê xwe nedihejand û ji bo li kesekî nenêre qet serê xwe
nedizîvirand viyalî wiyalî. Silavê li kesekî nake. Dema ji tabloya xwe aciz dibû, rûyê xwe di nav
rengan de dihişt û derdiket:
- Tu çi dikî Azad?
- Yadê, ez li Xwedê digerim.
Ji roja ku dînbûna wî eşkere bû, heta ku bû endamê artêşa komarê, ti kesî newêrîbû jê re bigota:
- Sîka te xwar e.

Heta vê gavê, Azado li ber tabloya xwe rawestiyaye û dibêje:
- Ezê Xwedê bi rengan çêkim.
ŞÊRBELLO
Tim tûrikê reş li nav pişta wî bû û digeriya:
- Ez gundan difiroşim. Tûrikê min tije gund in. Werin gundên firotinê “Rengo-qezembûkê - Doda
- Bilêqyê - Elîfero - Heremreş - Birîva - Heremê Şêxo - Olçya - Merkebê - Çetelê - Kerengo-
Gundor - Tel Şe’îrê.. Werin gundan, gundên erzan, xweşik, malê belaş.

Xelk li dora wî diciviyan û henek pê dikirin:
- Tê Doda bi çiqasî bifroşî?
- Bi pênc diravan, Doda buha ye.
-Na..buhaye.
- Ka sê diravan.
Pere distendin. Devê tûrik vedikir û gundek jê derdixist. Dengê wî dîsa li kolanan belav dibû:
- Werin gundan "Sorka - Xezalîkê - Şorik - Girêxêlid - Senceqê - Cewherya- Babxêrê - Telxenzîr-
Mozan- Nicim- Xirbexezal- Kevirêspî - Kêstek - Talikê - Çêlekê - Dîkê... werin gundan.
Yekî jê pirsî:
- Ma tu çima Amûdê nafroşî?
- Na, eger ez Amûdê bifroşim, ezê bi ku ve herim? Ez Amûdê nikarim bifroşim.
Ajovanê kemyonê li dora xwe zîvirî, ji pêvî Şêrbello ti kes nedît:
-Ji kerema xwe re, ezê paş de vegerim û ez rê nabînim. Tu bi destan ji min re bêjî wê baş bibe, ji
bo ez tiştekî xerab nekim. Şêrbello bi kêf pê ve hat:
- Tê gundekî ji min bikirî?
- Erê.. erê.
Bi serê ziman got. Şêrbello jê bawer nekir.
Ajovan nema li pişt xwe dinerî. Kemyon li gor liva destê Şêrbello vegeriya:
- Vegere.. vegere.. vegere. Bes, te ker kuşt.
Ajovan daket, termê kerê perçiqî ji bin tekeran derxist. Şêrbello reviya û mîna bazirganekî jêhatî
tûrikê xwe li ba kir. Gund di tûrik de neman, tev de rijandin erdê. Bû wezîrê koçkirinê.

Pasaportên xelkê ji wan distendin:
- Ezê di du rojan de “Vîza”yanî erêbûna derketinê ji we re bînim.
Tûrik mezintir kir. Nema bi firotina gundan razîbû.
- Werin dewletan; Elmanya, Swêsra, Frensa, Holanda, Rûsya, Siwêd.. werin dewletan bikirin.
Bira bira ye û bazar xuya ye. Welat bi perane, ev welatê we bêkêr e. Jiyan lê jehre.
Ti kes nemabû ku peyvên wî nas nedikirin:
- Kî dixwaze ji welatê jehrê here welatê hingiv? Welat bi pera ne, werin bikirin, tûrik mişt welat
in, welat jî mişt tûrik in û werin bazara welalan.
Şêrbello, her sibe, bi tûrikekî mişt welat derdiket. Û bi tûrikekî mişt pere û xwarin vedigeriya
Şermola.
MENCOLÊ
Sala hezar û nehsed û şêst û yekê, porê wê bi agirê sînema Amûdê şewitî. Bi hewara lawê xwe yê
bi tenê ve çû. Wê rojê bêhna goştê biraştî yê sêsed zarokên şewitî hawîrdora Amûdê girtibû.
Rahişt hestiyekî reş û vegeriya. Ji wê bûyerê ve Mencolê ji ser xwe çû. Ya ku dît, ti kes nebîne.
Deh, deh zarok di nav êgir de digevizîn. Xelkê miriyên xwe li Şermola veşartin. Kêm mal ji bajêr

bê mirî mabûn. Mencolê hestî xistin tabûteke biçûçik û di axa Şermola de veşart. Her ku lawikekî
biçûk li kolanê didît, ew maç dikir:
- Here malê, lawo here. Berî ku agir bi te keve.

- Here lawo, niha diya te li hêviya te ye.
Piştî bîst sal derbas bûn, dîsa jî her ku xortek didît, digotê:
- Xorto, niha lawê min jî wê wekî te bûya. Xwedêyo te çi malik li me xera kir.
Mencolê bi xwe re dipeyivî. Xelk ji agirê wê ditirsiyan. Gelekî agir dadida. Carinan hêrs dibû û
bi çolan diket:
- Ezê Amûdê mal bi mal bişewitînim. Ez zarokekî lê sax nahêlim.
Zêdeyî carekê ew tev li tenekeya mazotê girtin. Teneka mazotê di dest de bû û bi ser dîwaran de
dirijand:
- Çawa kezeba min şewitî, ezê jî kezebên we bişewitînim.
Ew berdidan, kirasê xwe dida ber diranan û diçirand:
- Li welatekî wilo dilkevir, divê mirov xwe tazî bike. Divê bi lingê xwe bipeyive, yan jî herdu
lingan hilde. Kî Xwedî namûse bela bê. Bela bê lawê min vegerîne.
Piştî sîh salî agir bi hebsê ket. Mencolê, berî jinên girtiyan, li ser laşê şêst girtiyên şewitî
rawestiya û qîriya:
- Duh sînema bû, îro hebs e. Xwedê zane sibe dora çi ye? Bişewitin, bişewitin, belkî hûn bêne
şûştin, encex agir tenê karibe we paqij bike. Hîn agirê sînema nehatiye vemirandin. Ev sîh salên
min in, ku ez dişewitim. Hîn tola wan zarokan li erdê ye. Canên wan sax in, eger hûn bawer nakin
jî bibînin.
Mencolê du tilî di devê xwe de tewandin û kir fîkînî. Sêsed leşkerên çekdar li ber wê rêzbûn. Bi

yek dengî gotin:
- Em amade ne dayê.
Mencolê bi serê lêvan vegerand:
- Niha herin... Heta ez we bixwazim
Her sêsed leşker bûn stûnek ji ronahiyê û bi valahiya ezman ve hilkişiyan. Mencolê keserên kûr
kişandin. Di firehkirina artêşê de diramiya. Ji Newafo re got:
- Emê her malekê dînekî tê de çêkin.
Newafo keniya.
Mencolê leşkerên xwe yên ji ronahiyê civandin û ferman da wan:
- Mêrxasino, divê hûn têkevin vî welatî, gav bi gav, mal bi mal. D înbûn pêwistiyeke Xwedayî
ye. Ji ber vê, divê her malek bi kêmanî dînekî wan hebe. Dawiyê... Mala bê dîn, divê bişewite.
Leşkerên Mencolê mîna sitêrkan ji hev belav bûn. Ji wê rojê ve, dîn û malên şewitî li welêt pirrtir
dibin.
MAMÛN
Mamûn ji xerabiyê hez dikir. biçûkanî tiştekî xwe li ber nedigirt. Gava tiştek dişikand, wekî ku
barekî giran ji ser pişta xwe bide alî, bêhna wî derdiket. Bawerî bi dê û bavê wî re çêbû ku Şeytan
di laşê lawê wan de ye:
- Hecî, emê wî bibin mala Şêxê mezin, dibe ku bê ser rê û baş bibe.
Ew ji mala Şêx vegerandin. Sê nivişt pê ve daleqandibûn. Lê ew nivişt a dinî rojê bibû pîşo. Bavê
wî û cîranan ew girêdan û dest xistin qeydê. Heft rojan ava xwê pê dane vexwarin. Bi daran

lêxistin, ji bo ku Şeytan ji laş û canê wî derkeve. Pişt re, ew berdan. Sê rojan dê û bavê wî
kêfxweş bûn, lê qet nizanibûn ku ev destpêka bahoza dînbûnê ye. Reviya, bi çolan ket. Bav jî bi
dû ket. Dixwest ku vê care bi gopalê xwe şeytên ji gewdeyê lawê xwe derxîne. Lê, Mamûn ji

tirimbêlekê dadiket, li yeke din siwar dihat, ji bajarekî diçû bajarekî û nedihat zeftkirin. Carekê
posteya ku ew têdebû qulibî, bîst û sê kes hatin kuştin. Mamûn li ser laşên wan rawestiya û bi
hevalê xwe yê mirî re keniya:
- Niha tu saxbûyî lawo, tu çi zû mir.
Keniya, heta hêsir ji tiliyên wî hatin. Vegeriya mal, Cîran tev de bi bîrê daketibûn. Bîr miçiqî bû.
Mamûn ji dûr ve hat û xwe ser serî avêt hundirê bîrê. Cîran û xelk tev de veciniqîn:
- Mamûn xwe kuşt.
Piştî kêlîkekê bû tiqetiqa kenê Mamûn û bang li wan kir:
- Werin min derxînin. Ez di avê de fetisîm.
Werîs berdan binê bîrê û Mamûn sipîsax derxistin. Ji wê rojê ve, av tê ku bi ser devê bîrê keve.
XELEFO
Li leşkeriyê, bû navmaliyê serleşkerekî mezin. Karê mala wî tev de li ser pişta Xelefo bû:
- Xelefo kanî taştê.. Şîv.. Keçikê bibe gerê.
Jina wî pirr xweşik bû. Di rojên pêşî de Xelefo ji ber spehîbûn û paqijiya wê ji ber xwe fedî dikir,

lê hêdî hêdî û bi demê re her dîwar di nav wan de hilweşiya. Carekê jinê jê xwest ku here odeya
xewê. Xelefo bilez çû li hêviya xwesteka wê ma. Nêzîkî wî bû, ew ajot ber text û destê xwe yê
nazik danî ser dêmên Xelefo. Bi paş ve vegeriya û li ser text rûnişt. Jin li cem rûnişt û destê xwe
danî ser çoga wî. Bi nermayî tiliyên wê ber bi zikê wî ve bilind bûn:
- Xanim... çççê nabe!
- Xelefo.. tu zanî mêrê min ji min re vala nabe. Eger vala dibe jî, dema xwe bi keçikan re
diqedîne.
-Lêêê.. ez nikarim.
-Eger tu tiştekî nekî, ezê ji mêrê xwe re bêjim, ku te dest avêtiye min. Xwedê tenê zane wê çi bê
serê te.
Xelefo di nav destên wê de bû gilokek ji agir. Xwe dît ku şilfî tazî di nav deryaya goştê sipî de
avjeniyê dike. Lê bextê reş mêr bi ser de şand. Tazî, di nav lepê serleşker de diperpitî. Çend salên
dûdirêj di zindanê de qedandin. Digotin; ji lêxistinê mejiyê wî çelq bûye. Bav û birayên wî bi
hezaran dirav xistin devên vekirî, heta ku karîbûn cihê wî nas bikin. Bi sedhezaran pere rijandin,
heta ku ew berdan. Xelefo derket:
- Heta ez sax bim, ez nikarim deynên xelkê li wan vegerînim.
Her şev xwe di bin çewalên mişt pere de, didît. Di xew de, her şev komên pereyan li erdê didîtin.
Heta niha xwesteka wî ji Xwedê ew e, ku carekê tenê, xewna wî bi cih bê.

BEŞÎRO

Kenê Beşîro bi nav û deng bû. Bi her tiştî dikeniya. Li şûna miriyan dikeniya bêhtir ku li dawetan
bikene. Li jinan dinêrî û dikeniya. Li mêran dinêrî û dikeniya. Ken dê û bavê wî bû.

- Çima mirov li ser lingan dimeşe, ne li ser destan?

Xwe davête erdê û li ser destên xwe dimeşiya. Dikeniya:

- Çima du çavên mirov in, ne çar û pênc in?. Çi xweş bû ku mirov di pozê xwe re avê vexwe, yan
bi zimanê xwe li tembûrê xîne, ha ha ha.

Dengê tirênê bi kenê xwe yê dirêj û “teqlo meqlo” derdixist. Berê xwe da cem kalikê xwe. Li nav
dewaran, kalikê wî gavan bû. Beşîro li golik siwar dihat. Garan dida dûv xwe û ew diçêrand. Her
ku ga li çêlekê siwar bihata, Beşîro dilîland û dikeniya:

- Çima çêlek û ga ji hev hez dikin? Çima golik napeyivin? Beşîro bi ramanên xwe re dûr diçû.

Garan li çolê dihişt, siwarê golik dihat bajêr:

- Dewar jî wekî me ne. Çima em goştê wan dixwin, ew goştê me naxwin?

Hate ber çavê wî, ku mirov rûniştiye û çêlekê bi saxî dixwe:

- Ev xwarin neketiye serê min. Roj bi roj zêdeyî carekê jî, gelo ne ji xwarinê ba wê dinya ne
xweştir ba?

Hefsarê golik kişand û vegeriya cem kalikê xwe. Golik berda nav garanê û tenê ma. Ji xwe re
dimeşiya û di halê mirovan û vê dinyayê de diramiya. Destê xwe dirêj dikir. Ji tiliyên xwe re

digot:
- Bileqin... bileqin!
Tiliyên wî dileqiyan.
Ji lingê xwe re digot:
- Raweste, raweste!
Lingên wî radiwestiyan.
Dikeniya.
- Çi kenê min bi laşê mirovan tê. Du ling, du çav, du guh, du poz, du dev, du... ha ha ha. Çima
mirov bi pozekî tenê ye ez nizanim?
Beşîro qelew bû. Cil bipîne bû. Tim zarokan kevir lê dibarandin û ew ditirsandin:
- Beşîro... golo hat te.
Direviya û dikeniya.
- Beşîro.. çêlê hat te.
Kenê xwe berdewam dikir. Leza xwe xurttir dikir. Bi vî awayî, ji garanê dûr ket. Berê xwe da
sînor. Xwe di nav van ramanên xwe de ji bîr kiribû. Ji nişkê ve gurmînî ji wan derûdoran hat.
Bombeyên sînor laşê wî kirin piçik û parî. Piştî mirinê jî, Beşîro dikeniya. Şevekê, gora xwe
vekir. Derket, li ser kêla gora xwe, bi xêzekê qalind, nivîsand û têra xwe keniya:
- Gelo çima mirov dimire?
BAVÊ BABIL
Li polik û bermahiyan digeriya. Her ku kevirekî kevin yan resmekî kevirî didît, dixist bêrîka xwe

û berê xwe dida cem kesên entîkenas, ku baş bi razên bermahiyan dizanin. Her kesî digot; ku gencîne li derdora Şermola hene. Gencîneyên veşartî ne. Gava ji Bavê Babil dipirsîn bê ew li wan derûdoran li çi digere, yekser bersiv dida:
- Mirîşka me winda bûye, ez lê digerim.
Di zivistanê de, cilên havînê li xwe dikirin. Di havînê de, cilên zivistanê li xwe dikirin. Tim îsot yan bacaneke reş di berîka çakêtê wî de bû, tam li ser dilê wî. Eger hêrs dibû îsot yan bacan di serê yê li kêleka xwe de lêdixist. Xelk jê ditirsiyan:
- Kanî diravekî, kanî weraqakê..
Kê zêde yan kêmî diravekî bida, wê îsotek yan bacanek, yan jî wê şiqamek bixwara:
- Keleheke hêjayî di bin vê erdê de ye. Ezê wê bibînim.
Tîne ber çavên xwe ku keleh wê, di demeke nêzîk de, deriyên xwe jê re veke û Bavê Babil wê
bibe şahînşahê dinyayê. Di dilê xwe de ji xelkê re digot:
- Erê, îro ji xwe re têr bi min bikenin, lê sibe emê bibînin bê wê kî bi kê bikene.

XANIMÊ
Xanima porhirî, destqop, xwediya qewsikê dijwar. Zarok dihatin cem, ji bo qewsikan ji wan re
çêke. Eger girr ji yekî bigre, dide dû, heta serê wî dişkîne. Lê ku serî neşike, diçe ber dîwêr û
bihêz xwe serê xwe lê dixîne, heta ku radiweste û dikeve. Eger bi kêf be û kesek jêre bibêje:“Tu
çawayî Xanimê” dibêje; kanî maçekê. Karê wê teqandina kîsên naylonîye.Bi devê xwe kîs tije ba

dike û bi destê saxlem diteqîne. Xeberan ji jinan re dide:
- Ezê serê Hecî Hemo bi we vekim.
Ji Şêxo hez dikir. Serê sê salane ku di ber guhên yên dora xwe re davêt:
- Herin Şêxo ji min re bixwazin. Ji bo tola min ji dijminan re nehêle.
Zarok digirtin. Tiştên wan, guhar, lîstik, pere, ji wan distendin. Çi diket ber destê wê, davêt
bêrîkên xwe. Xuyabû ku hezkirinê pişta wê şikandiye. Jin jî ku ji dil hez dike, gava dimeşe, evîn
li dewsa piyên wê şîn tê. Giya li ber lingên wê û bi gavavêtina wê re şîn tê. Heta di xewnan de,
navê Şêxo li ser zimanê wê bû, lê niha di komarê de, bûye xanimek nû. Li ser keçik, jin û pîran
digere. Di nav zindî û miriyan de, pirsa jinê û bindestiya wê dike:
- Eger ez ne jin bama, ez dîn nedibûm.
Nerînên wê, ne wek yê kesekî bûn. Xwedê ji jinan acizbû, ji loma ev bar danîne ser pişta wan.
Hîndero tim digot; „Diya me Hawa, bavê me Adem ji ser rê bir û ya ku diya me Hawa ji ser rê bir
mar bû. Ji ber vê, Xwedê ji du tiştan hez nekiriye jin û mar“.
Mirî bi ramanên Xanimê şa dibûn, lê Xanimê zû û bilez ramanên xwe diguhertin:
- Ji ber ku ez jin im.
Xwedê gelekî ji jinan hez kiriye. Nemaze yên xweşik. Lewra evqas şahî û xweşî xistiye
gewdeyên wan. Dikeniya:
-,Ax Şêxo, xweska te zanîba bê jin dema ku hez dike çiqasî kare bide.
Wê şevê, tariyê erd û ezman xwaribûn. Tenê, agirekî dîn bala zarokan kişandibû. Xanimê porê

xwe dabû ber meqesan û xwe û porê jêkirî kiribû xwarina agirekî ku pirîskên wî li derûdora
Şermola bitevayî belav dibûn. Dixwest xwe û Şermola bi hev re bişewitîne.
EHMEDÊ DÎN
Ti wezîr mîna wî kêfxweş nebûn. Çi tiştê ku di jiyanê de bidest neketibû, niha lê digeriya. Tenê
keçika ku bi salan jê hezkiribû, destê xwe jê şuştibû û di hundirê wî de mabû hesreteke ji kevir.
Çixare bêpere li miriyan digerandin. Bi wan re şev bi çixareyên vêketî dixemilandin:
-Bê çixare, dinya ne hêja ye perîkekê.
Bîranînên wî, ew dêşandin. Nemaze ew carên ku xelkê bi minet çixare didan dest wî:
- Bira ka çixarakê.
- Qey tu ji çixarê têr nabî?
Niha çixareyan li ber derî û pencereyan belav dike:
- Ez çiqas dixwazim ku xelk têr çixare vexwin.
Xweştirîn dem li cem wî ew bû, ku çixara xwe sor bike û li hêviya derketina keçikên dibistanan
bimîne. Nemaze keçikên şanzde hijde salî:
- Di vî temenî de, agirê wan mirov dişewitîne.
Keçik kêmî şanzdan û zêdeyî bîstan nehêjane çixarakê. Kesin dibêjin ku keçik bi dû dînbûna
Ehmed de ne. Her ji keçikekê hez dikir, ku zêdeyî bîst salan dikir, li ber çavê wî reş dibû. Diçû
yeke din. Hetanî ku rastî evîneke dijwar hat û wê evînê cendekê dilê wî li ber lingan rast kir. Piştî

pênc sal hezkirin, keçikê ev bersiv dabû wî:

- Tu wek birayê min î.
Ehmed, geh dikeniya, geh jî digiriya. Piştî salekê nema karîbû, ne bikeniya, ne jî bigiriya. Mîna
kêzikeke biçûçik ku di nav tevnên pîrepîrê de asê bimîne, Ehmed jî di nav tevnên evîna xwe ya
têkçûyî asê mabû. Her û her ji keçikê hez dikir û di ber deriyê wan re diçû û dihat. Keçikê mêrek
kir û berda û dîsa çavê xwe li yekî din digerand, lê hîna jî Ehmed bi dilê xwe lê dinêrî û keçikê ne
bi dilê xwe, ne jî bi çavên xwe ew nedidît. Sînga Ehmed werimî, bi nexweşiyeke nenas ket. Çû
cem bijîşkan:
- Nexweşiya te, ya dile. Vexwarina çixarê kêm bike.
Dilê wî, gav bi gav, diwerimî û rehên wî kêlîk bi kêlîk, zuha dibûn.
REŞÎDÊ KAL
Ji bo wî dîn li hevdu civiyan:
- Evê rewşenbîr di nav me de çi dike?
- Ew jî ji miriyên Şermola ye.
- Ne dîn bû. Ev çima wekî dînan wisa bûye?
Reşîdê Kal li ber gora xwe rûniştibû. Bi çavên tijî hêsir li aliyê zindiyan dinêrî:
- Çi bela te ye?
- Ez, di rewşa van zindiyan de, diramim.
Şevekê ji xew rabû û axa Şermola bi ser serê xwe de dêra. Dînan jê pirsîn:
- Tu çima wisa dikî?
-Binerin min çi çand û ez çi diçinim?. Herin bipirsin hûnê nas bikin.

Keserên Reşîdê Kal ji kûraniya dilê wî derdiketin. Zindana Dêrikê hat bîra wî, wisa jî reva dijwar
û qiriktalî. Dewsa şivên cendirmeyan yên li ser destên jina wî Xatûnê hat bîra wî, pê re jî
miçiqandina şîr di herdu pêsîrên wê de. Mirina zarokê wî yê du mehî ji ber birçîbûnê. Fira
hechecîkan li dorê û kevokên ku ew diparastin. Destnivîsa pirtûka wî ya ku bîst û yek salan di
nav buxçika Xatûnê de veşartî mabû. Hêsiran zora wî birin. Girtîgehên Dêrikê, Tedmurê û Mezzê
li ber çavên wî diçûn û dihatin. Işkenceya wan salan û libendemana bidarvekirinê, rewşa zindiyan
anîn bîra wî. Her sibe û her êvar Reşîdê Kal xwe daqûl dikir û li jora çoga xwe dinêrî:
- Tifûû.. ev çi bû û te çi li dû xwe hişt.
Mirî lê diciviyan. Kêfa wan jê re dihat. Bîranînên wî li ser her zimanî bûn. Ji bakur heta başûr,
gera bi piskilêt, şikandina lingê wî, sê rojên ku li ber germa tîrmehê bi koka darekê ve birçî û tî
girêdayî mabû, gramera zimanê kurdî û dawiya dawî jî nexweşiya ku kezeba wî di girtîgehan de
peritandibû. Mirî hem bi rewşa wî digiriyan, hem jî kêfxweş dibûn. Bi pirsên wan re ezman
birûsk vedidan:
- Qey çi bûye?. Çi li dû te ma ye?
Reşîdê Kal bi dilekî giran giran serê xwe dihejand:
- Ê zane zane û ê nizane baqê “bênamûsan e.”
Xwe dida ser gopalê xwe û tiliya xwe bi hêza xortekî bilind dikir:

- Ez ji wan re nahêlim. Ew heta qirikê di nav gunehê min de mane.
Miriyan li dînan dinêrîn. Dînan jî li hevdu dinêrîn. Pirseke sêwî, ji çavên tevdan diweşiya:
- Gelo Reşîdê Kal li ser kê dibêje?
Rewşa komarê hiştibû ku mirî û zindî vê pirsê û gelek pirsên din ji bîr bikin. Her yek bi karê xwe
daketibû. Ti kes vala nemabû. Pêlên guherandin û tevger û lebatê erd û ezmanê Şermola dabûn
ber xwe. Kêfa zindî û miriyan ji hev re dihat. Şer di nav wan de nema derdiket. Yekemîn car bû,
ku her tişt eşkere dibe û zindî têdigihêjin ku mirî ji wan çêtir dijîn. Bi derbasbûna yanzde mehan
re çavên wan xweşik vebûbûn, lê destê wan di dilê wan de bû. Tirsê dirêj nekir. Bû rastî. Wê

şevê, ji dilê tariyê, bi hezaran leşkerên cilreş, ne mirov bûn, ne jî lawir bûn, kişiyan. Bû qêrîna
sofiyan:
- Qiyamet rabû... Qiyamet!
Na! Ne qiyamet bû. Tiştekî nêzîkî wê bû. Bi sedhezaran leşkerên cilreş ji laşê şevê herikîn. Mîna
kurmik û maran xwe berdan nav malên zindiyan. Werîs li qirika Hîndero û Smaîlo û Şêxo
gerandin. Ew bi darvekirin. Cendekên her sê dînan li ser girê Şermola, di nav çarçirayan de, li ba
kirin. Zindî jî tar û mar bûn. Yek ji wan li ser lingan nehiştin. Ji wê rojê ve, li vî welatî, zindî

xuyanî nakin. Heta niha dibêjin; ku nîvê xelkên Amûdê mirî ne û nîvê mayî jî dîn in.
Çîroka Dawî
(Ya ku ji hemû çîrokan dirêjtir e)
Pere
FIRAT CEWERÎ
çîrok
Kevoka spî
www.nefel.com
info@nefel.com
NEFEL

Kevoka spî
1
KEVOKA SPÎ

2

Kevoka spî
FIRAT CEWERÎ
NEFEL
Stockholm
2002
www.nefel.com
info@nefel.com
3
KEVOKA SPÎ

Firat Cewerî: Kevoka spî
Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden
www.nefel.com
info@nefel.com
© Firat Cewerî û Nefel
Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-973195-4-6
Çapa kevin: Nûdem
Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan
Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.
Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.
4

Nêverok

Kevoka spî 7
Dilê şikestî 15
Şeva sersalê 23
Doktor Sertaç 29
Heyştê adarê 37
Stêrkek ji ezmanê me xuricî 41

Xewna Orhanow . . . .
43
Kêzika bênav . . . . . .
49
5
KEVOKA SPÎ
6

Kevoka spî

Ew pênc roj berê ji girtîgehê hatibû berdan. Digel ko emrê wî hê bi tenê sihûpênc bû jî, tayekî reş di porê wî de nemabû. Gepên wî kort bûbûn û qermîçokên rûyê wî bûbûn mîna yên kalan. Ew rûyê wî yê gewr û jîndar niha zer bûbû. Bejna wî ya dirêj ko demekê ji keçikên mehelê re mereq bû ko bidîtana, tewiya bû. Ew êdî ne xortekî berî niha bi panzdeh salan bû, bûbû mîna kalekî.

Erê, ew pênc roj berê hatibû berdan... Û niha, li qatê sisiyan, li ber pencereya odeya xwe ya xebatê rûniştibû û li derve, li barana pêşî ya payizê temaşe dikir. Car caran ji nişkê ve dikeniya, bi pistînî tiştin digotin û dîsa bêdeng dima. Ev yeka han berhema salên wî yên girtîgehê bû. Berî pênc rojan, gava ew ji girtîgehê hatibû berdan, bavê wî û merivên wî yên nêzîk bi vê yeka han hesiyabûn, loma wan ew zû nîşanî doktorekî nas dabûn, doktor tiştek jê fêhm nekiribû, bi tenê gotibû: »Divê hûn wî bibin Ankarayê«. Lê ne wî dixwest here Ankarayê, ne jî rewşa malbatê ewçend baş bû ko ew bibira Ankarayê. Rojekê jî wan pîrek ji gundekî çiyê anîbûn, da ko pîrê hin dermanan jê re çêbike û tiştekî li ser bixwîne, lê ew belkî zêdeyî deh deqîqan bi pîrê keniyabû, paşê xwe avêtibû ser pîrê, destên xwe xistibûn qirika wê û ger ne ji endamên malê bûya wî ê li wir ew pîr bixeniqanda. Pîra ko bi zorê xwe ji nava lepên wî filitandibû, di

derî re derketibû û bi xurtbûna xortekî bazdabû.
Barana ko dihat carinan xurt dibû, carinan mirov digot qey wê dawî were, kêm dibû, lê dîsa bi xurtî dibariya. Wî jî herdu enîşkên xwe danîbûn ser masê, serê xwe xistibû nava kefên destên xwe û bêyî ko çavên
xwe bikutkutîne li barana pêşî ya payizê dinihêrî. Carinan dixwest dilopek baran ji hewa de heta ko bigihîje erdê taqîb bike, lê hew dinihêrî ko dilopin din diketin ber wî û bala wî dîsa belav dibû. Ew cerekê jî li hebûna baranê fikirî. Wî ew perçeewrên reş yên li ezmên şiband deryayeke weke moxilê biqul. Di wê navê de dîsa ew pîrika wê rojê hate bîra wî. Ew dîsa mîna wê rojê bi pirqîn û bi dengekî bilind keniya. Paşê bi carekê ve kenê xwe birî. Çavên wî beloq bûbûn. Wî ew çavên xwe yên
7
KEVOKA SPÎ

beloq bera ewr dabûn. Erê, rast bû, di nav ewrê reş de kevokeke spî xuya dikir. Ew kevoka spî her ko nêzîk dibû mezin dibû, her ko mezin dibû dişibiya xweha wî. Erê, ew xweha wî bû. Wî bi çavên xwe didît.
Vê carê enîşkên xwe ji masê hilanîn, bi herdu destan xwe hişk bi masê girt û ziq li xweha xwe nihêrî. Kirasekî tenik li xweha wî bû, guliyek ji de-hfên hespan li eniya xwe girêdabû û li ber pencereya wî difiriya û dixwest di pencerê re têkeve hundir. Gava mêrik ev yeka han ferq kir, hema ji ci-hê xwe pengizî û pencere vekir. Bi vekirina pencerê re xweha wî firiya hundir. Digel ko li derve baran xurt dibariya jî dîsa keçik şil nebûbû. Çavên keçikê mîna du morîkên şîn dibiriqîn û lêvên wê yên dagirtî di rengê sorbûna hinarîkên riwê wê de bûn. Bejna wê dirêj, newqa wê zirav û hêtên wê dagirtî bûn. Ew bi wî awayî li quncikeke odê li ser lingan rawestiyabû, baskên xwe bera ber xwe dabûn, stûyê xwe xwar kiribû û bi

rewşa birayê xwe digiriya. Wê digot:
— Keko ev çi bi te hatiye? Birayê mino kanî xortaniya te? Te çima xweha xwe kuşt? Çawa destên te li min geriyan û te ez kuştim? Çawa destên te li xweha te, ya ko te ewqasî jê hez dikir, geriya?
Axx... Min çi bêriya te kiriye. Axx... Ez çi dixwazim te hemêz bikim. Ez çi dixwazim birayê xwe tayê bi tenê hemêz bikim. Ez çi dixwazim rohnîka çavên xwe hemêz bikim. Kekê mino, bavê mino, birayê mino... Lê ez nikarim. A niha destên min bi te bibin ez ê winda bibim. Ji ber ko ez mirî me, te ez kuştime... Axxx... Kekê mino, min çiqasî ji te hez dikir. Ma nayê bîra te gava em li ser daweta te dipeyivîn? Te ji min re digot, divê tu serê govendê bikişînî. Ma tê bîra te kekê mino? Tê bîra te bê ji daweta te re çiqasî hindik mabû? Piştî te ez kuştibûm bi salekê dergîstiya te jî xwe avêtibû ber tirênê û xwe kuştibû. Tam hûn ê wê rojê bizewicyana û min ê wê rojê serê govenda birakê xwe, tayê bi tenê bikişanda. Tam wê rojê dergîstiya te bûbû mêvana min. Wê ji min re behsa rewşa te kiribû û wê gotibû piştî ko te ez kuştibûm, tu hatibûyî girtin. Wê jî îdare nekiribû. Ji derdê evîna te xwe avêtibû ber tirênê û miribû. Zû de ye haya min ji wê tuneye. Ji wê şeva ko em bi hev re li girtîgehê hatibûn xewna te û pê ve min ew nedîtiye. Ger ew bibihîze tu hatiyî berdan, ew li ko be ew ê were. Me çend caran bi hev re xwest em werin seredana te, lê gardiyanan em di-
tirsandin, em ji wan newêrîbûn bihatana. Dergîstiya te her li te difikire. Wê roja ko hatibû mêvandariya min, ji min re gotibû, bi çi awayî dibe bila bibe, ez ê xwe bigihînim wî. Wê zewac li herdu dinyan li xwe heram kiriye. Ew li ser te dîn bûbû kekê mino, ew tenê ji bo ko te ez kuştibûm
8

hebekî ji te qeherî bû. Lê roja ko mêvana min bû, min jê rica kiribû, ko

kekê min efû bike. Wê jî soz dabû min ko ew ê te efû bike. Min jê re gotibû, çi dibe, birakê min tayê bi tenê ye, wî efû bike. Min gotibû, birakê min guneh e, pir diltenik e. Min gotibû, birakê min heta îro gêrikek neêşandiye, lê ez kuştime, xem nake, ew jî ne sûcê wî bû kû... Xelkê lê wilo kir. Ger xelkê li te wilo nekiriba te ê ji kû xwaka xwe bikuşta? Wê ji kû destê te li min bigeriya? Min ji dergîstiya te re got, gava te bera min dabû, te çavên xwe girtibûn. Min got, destên wî li min nedigeriyan. Min got, wî pir ji insanan hez dikir. Û min got, te ji min jî pir hez dikir. Ma ne wilo ye? Qey te ji min hez nedikir? Ma tu ji min hez nakî kekê mino?
Xilolîkên hêsirên çavên mêrik di ser riwê wî yê nekurkirî de gêr dibûn ser çena wî û paşê dinuqutîn erdê. Êdî ew mîna zarokekî bi îskîn digiriya. Wî dixwest serê xwe deyne ser milê xweha xwe û bi dengekî bilind bigirî. Dixwest uzra xwe jê bixwaze. Dixwest jê re bibêje ko wî çiqasî bêriya wê kiriye. Dixwest poşmaniya xwe bîne ziman.
Xwe winda kiribû. Ber bi xweha xwe çû, ko wê hemêz bike, lê xweh li ber geriya û jê re got, ko destê wî pê bibe, ew ê winda bibe. Lê mêrik xwe negirt, xwe avêtê; bi avêtina wî re keçik winda bû. Mêrik deverû, li hundirê odê kete xwarê û bi ketinê re serê wî li qorziya masê ket û serê wî
mîna ko perçe bûbe, xwîn jê hat. Ew bi şikandina serê xwe nehesiyabû. Heya ko diya wî ket hundir, bi qêrîn bang cîranan kir, hingê ew hêdî hêdî, mîna ji xeweke kûr şiyar bibe, bi ser hişê xwe ve hat û têgihîşt ko li erdê ye.
Ew barana ko di pencerê re li hundir xistibû, kaxiz û pirtûkên li ser masê şil kiribûn û av herikîbû ser tej û xaliyên raxistî.
Bi alîkariya cîranan ew rakirin nexweşxanê, doktoran, ko yek jê hevalê wî yê zaroktiyê bû, serê wî pansûman kirin, bi xavikekê girê dan û ji bavê wî re gotin, da wî rakin Ankarayê, an jî ko îmkanê wan hebe, wî bibin

Ewrûpayê. Bavê wî ji bêîmkaniya xwe gazin kir û ji bo bikaribe alîkariyekê ji cihekî bistîne, ji doktorê hevalê lawê xwe daxwaza hin şîretan kir. Doktor jî soza tiştê ko jê bê dayê û bi rewşa hevalê xwe yê zaroktiyê, ko ewçend zîrek û jêhatîbû, xemgîn bû.
Zîrektî û jêhatîbûna wî ji aliyê herkesî ve dihate zanîn.
Berî panzdeh salan, di îmtihana tibbê de, ew di nav sed û pêncî hezarî de yê şêstemîn derketibû û ew hevalê wî yê ko niha li nexweşxaneya bajarê wan doktorî dikir bi zorê bûbû yê hezarî. Wî hê di salên xwe yên lîseyê de piraniya klasîkên fransiz û rûsan xwendibûn û di qayişkişandina
9
KEVOKA SPÎ

çîrokan ya rojnameya bajêr de bi çîroka xwe ya bi navê »Mêrikê Serxweş« bûbû yekemîn û paşê ew çîroka wî li Ewrûpayê ji aliyê hevalekî wî ve li almanî hatibû wergerandin û niha jî ew çîrok di antolojiyeke bi nave »Edebiyata Rojhilat« de li Almanyayê ji aliyê weşanxaneyeke naskirî ve hatiye çapkirin. Herkesî bi vê zîrekbûna wî dizanîbû. Heta, apê wî, yê ko reîsê belediya bajêr bû û gelekî jê hez dikir, soz dabûyê ko dê wî ji bo stajê bişîne Îngîltereyê. Lê gava kurtûpista ko wî di bin tesîra apê xwe de xweha xwe kuştiye, li bajêr belav bûbû, pir kesan bawer nekiribûn û ji bo ko dilê xwe têxin cih, ew bi hin karkerên belediyê re peyivîbûn. Karkerên belediyê jî nedixwestin diyar bikin ko serokê wan bûye sedema vê trajediyê, wan tenê bêdengî dipejirandin. Li gora dihat gotin û di nava bajêr de belav bûbû, çîrokê wilo dest pêkiribû: Xweha wî ya ko bi xweşikbûna xwe di bajêr de deng dabû xwestiya pismamê xwe bû. Biryara wê xwestinê jî hê di pêçekê de ji aliyê herdu biran ve hatibû dayin; lê herdu zarokên ko di aliyê karekter de gelekî dûrî hevdu bûn û ew pismamê ko ji aliyê keçikê ve qet nedihat hezkirin û hebandin, ketibû derê riya wê.

Keçikê jî hewesa xwe berdabû ser xortekî cîranê mala xalê xwe û rojekê gava êdi têdigihên ko tu riyên din tuneye, bi hev re baz didin. Ji bo şopê ji ser xwe dagerînin û nekevin dest, her gav cihê xwe diguherin, tu carî zêdeyî şevekê li cihekî namînin, lê piştî sê mehan, li Îzmîrê, li barkêşekî nas rast tên û barkêşê ko bi tesadufî bi reva wan hesiyabû û xelata ko apê keçikê ji bo girtina wan soz dabû, bihîstibû, timayî zora wijdan biribû û ji malbata keçikê re xeber şandibû, ji aliyê din jî bi dek û dolab û bi dostanî bi dû herdu dilketiyan ketibû û gava rojek ji rojên havînê ya herî germ ew bi apê keçikê, bavê wê û du pismamên wê re ketibûn hundir, herdu dilketî şaş û ecêbmayî mabûn, lêwik hema destê xwe avêtibû destê hezkiriya xwe û xwestibû bazdin, lê apê kêçikê, yê reîsê belediyê bû û bi laş û gewde bû, hema xwe avêtibû qemçika paş stûyê lêwik, ew ber bi xwe
ve kişandibû, paşê heta jê hatibû ew ber bi dîwêr ve dehf dabû, pişta wî li
dîwarê çimento xistibû, lawik bi belqîn vereşiyabû, lê hîn berî ko ew bigi-hêje bi pişta destê xwe devê xwe pakij bike, vê carê lawê reîs, yê ko di nav
malê de gelekî delalî rabûbû, lê pir tirsonek û ji aliyê laş û gewde jî de qet nelihev bû, heta jê hatibû kulmek li ser çavê lêwik xistibû. Keçikê îdare nekiribû, êrîşî wan kiribû, gava apê wê xwestibû lêxe, destê wî gez kiribû, di wê kêlîkê de barîna ko ji apê wê hatibû bêtir barîna gayekî anîbû bîra mirov. Lê herdu dilketiyan herçiqas li ber xwe dabûn jî, dîsa nikaribûn xwe ji nav destên wan bifilitînin, heta ko tarî ketibû erdê ew bi dest û
10

lingên wan ve girêdabûn, ew avêtibûn dawiya dolmîşê û hezar û dused kîlometre, digel ko tenê sê caran sekinîbûn, çûbûn. Di sekinandina cara

çaran de, lêwik xwe bi awayekî vekiribû, weke guleya devê tivingê xwe di derî re avêtibû, xwe avêtibû dû pîqabek ko nuh ji benzînxanê hereket dikir û çûbû. Her çiqas hin ji van bi dû pîqabê de bazdabûn jî, pere nekiribû; pîqab zû derketibû ser rê û bi sureteke xurt ji wir bi dûr ketibû. Apê keçikê pîlaqa pîqabê nivîsandibû û ji mêrikê kal yê li ber benzînxanê pirsa wê pîqabê kiribû. Mêrikê kal heqê benzîna xwe jê stendibû, bi neyînî serê xwe hejandibû û pirsa wî bê bersiv hiştibû. Ew li dolmîşa xwe siwar bûbûn, ji benzînxanê derketibûn û piştî sê saetan, saet donzdeh û nîvê şevê gihîştibûn bajêr. Di ketina bajêr de gava dewriye di rê de li wan rast hatibû û dîtibû ko reîsê belediyê ye, silav lêkiribûn û bêyî ko li dolmîşa wan saxtî bikin ew berdabûn. Wan jî rast ajotibûn ber deriyê mala bavê keçikê, pismamê wê bi guliyê wê girtibû, ew ji dolmîşê derx-istibû, di hewşê de bi dû xwe de kişkişandibû û biribû avêtibû hundir. Gava diya wê ji xew şiyar bûbû, keçika xwe ya mîna guleke bêstirî di wê rewşê de dîtibû, xwe negirtibû, xwe avêtibû ser wê, lê bavê keçikê çend pehîn li wê xistibûn, jê re gelek xeberên ne li rê dabûn û bi bazdana keçikê ew jî sûcdar kiribû. Paşê zilaman keçik di nav xwe de hilgirtibûn, ew biribûn xaniyê banî, ji nû ve girê dabûn, derî li ser wê kilît kiribûn û sê roj û sê şevan ne avek ne jî pariyek nan dabûnê. Dotira rojê mala apê wê ji birayê wê yê li Stenbolê re telefon kiribûn, lawik bi balafirê hatibû, li wê rewşê şaş mabû, pêşî bawer nekiribû, dû re gava apanê wî xistibûn serê wî
û xwestibûn ko ew namûsa xwe pakij bikin, di nava xelkê de dîsa weke berê bi serbilindî bijîn, jê re demançeke çekî ya ko destikê wê ji aliyê zîvk-erekî asûrî ve hatibû neqişandin, peyda kiribûn û xwestibûn ko ew bi destê xwe, wê dêlika xweha xwe bikuje. Pêşî lêwik qebûl nekiribû, herçiqas dixwest xweha xwe biparêze jî ji ber hin sedeman newêrîbî. Ew bûyera ko di nava bajêr de belav bûbû, ji bo malbata wan ya naskirî kê-

maniyeke mezin bû. Û ji bo ko dîsa rûyê malbatê spî bibe, şeref û namûsa wan bi dest bikeve, kuştina keçikê pêwîst bû. Lêwik jî bi vê yeka han dizanîbû. Loma kuştina xweha xwe qebûl kiribû, demançe ji apê xwe stendibû, du caran ketibû hundirê oda xweha xwe, jê nîşan girtibû, lê dîsa jî destên wî lê negeriyabû, bernedabûyê, tenê li ser lingan rawestiyabû û ziq li xweha xwe nihêrîbû. Xweha wî jî stûyê xwe xwar kiribû, bi porê xwe yê jihevdeketî û bi rewşa pîreke çîrokî li birayê xwe nihêrîbû. Ne wê, ne jî birayê wê tiştek ji hev re negotibûn. Roja sisiyan gava birayê wê şev nîvê

11

KEVOKA SPÎ

şevê bi şidet derî vekiribû, xweha xwe li ser lingan di qorzîka odê de dîtibû.

Gava xweha wî çav li wî ketibû, mîna ko zanibe ew ê vê carê were kuştin, bi birayê xwe re keniyabû. Ew hingê li ber çavên birayê xwe bûbû weke pîrhebokekê. Lawik ji wê rewşa wê bêhawe tirsiyabû, weke ko tu satilek av bi ser de birijînî di xwêdanê de mabû. Çavên wî weke du bi-zotên êgir sor bûbûn û beloq bûbûn û bi qêrînekê re bera xweha xwe dabû. Gulleya pêşî ko berdabûyê mêjiyê wê ji hev belav kiribû û ji ber ko berra eynî cihî dabû, lê keçik bi gulleya pêşî re çokên wê fisiyabûn û hêdî herikîbû erdê, her heft gulleyên ko berdabûnê li eynî cihî ketibûn.

***

Êvarî, gava wî xwe bi serê girêdayî li ser nivînê xwe dirêj kiribû û ziq li zikê odê dinihêrî, ew li wê yekê difikirî. Li salên xwe yên girtîgehê difikirî. Gelek serpêhatiyên wî hebûn. Ew bi gelek kesan re rabûbû û rûniştibû. Gelek kesên naskirî dîtibûn. Ji bo derbaskirina wextê xwe û ji bo ko ew xwe ji bîr bike gellek pirtûk xwendibû. Paşê rewşa wî xerab bûbû, destê

wî li xwendina pirtûkan sar bûbû, wî seredanên ko dihatin bi paş de vedigerandin, heta demek pir dirêj bi heval û dostên xwe yê girtîgehê re jî nepeyivîbû. Ew li vê yekê jî difikirî. Paşê ji nişkê ve rabû û li ser xwe rûnişt. Piştî kurtedemekê jî çû odeya xwe ya xebatê. Berî panzdeh salan gava hîn berî ev bobelat bi serê wan de were, rewşa malbata wî ya aborî pir baş bû. Ji bilî xaniyê wan yê sêqatî, sê dikanên wan yên kincan jî li bajêr hebûn. Ew odeya xebatê bi tenê ya wî bû. Ew çû, dîsa li ber masa xwe rûnişt, herdu enîşkên xwe danîn ser masê, serê xwe xist nava kefên herdu destên xwe û ji pencerê li derve nihêrî. Ev yeka han ji roja ko ew hatibû berdan jê re bûbû mîna adetekê. Ji nişkê ve çavên wî beloq bûn û li dûr nihêrî. Erê, ew ne şaş bû, ya ko ji dûr ve xuya dikir û xwe li wî girtibû û bi firîn dihat xweha wî bi xwe bû. Lawik hema ji cihê xwe pengizî û pencere vekir. Xweha wî di pencerê re ket hundir û dîsa çû quncika xwe ya berê.

— Min ji te re gotibû, kekê mino, got. Min ji te re gotibû, ko destên te bi min bibin ez ê winda bibim. Niha divê tu destên xwe bi min nekî. Ger tu destên xwe bi min bikî ez ê dîsa winda bibim.

Carekê mîna ko winda bû lê dîsa xuya bû. An jî mêrik wilo hîs kir. Vê carê ziq li hêla xweha xwe nihêrî; dît ko erê, rast e, ya ko xwe di quncika

12

xênî de kiriye qomik û stûyê xwe xwar kiriye, xweha wî ye. Xweha ko berî niha bi çend deqîqan bi kirasekî spî û tenik bû û rûyê wê gewr û hinarîkên wê sorik bûn, niha li ber çavên mêrik bûbû mîna berî bi panzdeh salan; porê wê ji hevdeketî, kirasê wê qetiyayî, zeyif û bêhêz. Loma mêrik ji nişka ve kire qîrîn û bi qîrînê re jî çend caran li ser hev got: »na, na!« Bi dengê qêrîna wî re dê û bav û xwişkên wî yên biçûk şiyar bûn, lê gava dîtin ko tiştek tuneye dîsa çûn cihên xwe. Lê diya wî pencera oda wî girt,

ew li ser mînderê da dirêjkirin, demekê li ber serê wî rûnişt û serê wî yê ko di rengê berfê de bû, mist da. Wî jî eynî weke zarokekî biçûk serê xwe danî ser çonga diya xwe û herdu congên xwe kişandin zikê xwe. Diya wî gunehê xwe bi wê rewşa lawê xwe anî û ew lawê wê yê ko weke çiyayekî bû, lê niha ketibû wê rewşa xerab, dil û cergê wê disot. Ew demekê li zaroktî û xortaniya lawê xwe fikirî û ew keçikên mehelê ko ji bo lawê wê yê çeleng çiqasî xatir û qîmeta wê digirtin, bi bîr anî. Her ko diya wî serê wî mist dida, wî jî xwe hîn bêtir weke zarokekî hîs dikir û hêsirên çavên wî weke dilopan diherikîn erdê. Diya wî jî ji bo ko hêsirên wê neherikin ser riwê lawê wê, bi destmala serê xwe hêsirên xwe pakij dikir û nifirên dinyayekê li mala apanê wî dikir. Mala apanê wî ko demekê tade û nehe-qiyeke mezin li wê kiribûn û ew apê wê yê ko bûbû sedema kuştina keça wê û bûbû sedema ko kurê wê têkeve wê rewşê.

Wê, nifir li wî apî dikir. Wê di dilê xwe de nifirên xwe dikirin. Wê dig-ot, te warê min kor kir, Xwedê warê te jî kor bike. Wê digot, te mala min xerab kir, Xwedê mala te jî xerab bike. Wê digot, Xwedê ava reş bi çavên te de bîne. Wê digooot û digot.

Mêrik piştî demeke kurt li ser çonga diya xwe di xew re çûbû, lê diya wî ji bo ko wî şiyar neke, heya saet sisê şevê bêyî ko xwe tev bilivîne, di bin serê kurê xwe de rûnişt. Lê heya êdî ji ber tevizandina lingê xwe debar nekiribû, mecbûr mabû kurê xwe, ji bo ko ew here ser nivînê xwe razê, şi-

yar kiribû. Lawik jî ji nişkê ve ji xewê pekiyabû û ew xwêdana ko ji tesira xewna wî ya tirsê mabû bi pişta destê xwe pakij kiribû. Diya wî bi destê wî girtibû, ew biribû oda wî ya razanê, ew li ser nivînê wî dirêj kiribû, rûyê wî maçî kiribû, lampa wî vemirandibû, hêdîka deriyê wî girtibû û derketibû. Yê mêrik jî xewa wî nehatibû, piştî derketina diya xwe bi nîvsaetekê rabûbû ser xwe û dîsa çûbû oda xwe ya xebatê. Çer ko ketibû

hundirê oda xwe ya xebatê pencera xwe vekiribû, lê dîsa girtibû, paşê dîsa
vekiribû. Vê carê ji nişkê ve ji hundirê odê dengek hatibû. Mêrik veciniqîbû, li paş xwe zîvirîbû, dîtibû ko dîsa xweha wî li quncika odê
13
KEVOKA SPÎ

stûyê xwe xwar kiriye û dixwaze ji birayê xwe re tiştinan bibêje. Birayê wê
jî hebekî berepaş çûbû, li quncika din ya odê li ser kursiyekê rûniştibû û wî jî bi stûxwarî li xweha xwe nihêrîbû. Carekê, mîna niqutî dilê wî ko ew ne xweha wî ye, bi tenê li ber çavên wî wilo dibe, lê weke xweha wî dizanîbû ew çi fikiriye, loma zûka ji wî re gotibû:
— Ez xweha te me, bavê mino! Ez Sorgulê me. Ez niha ji ba dergîstiya te têm.
Mêrik dîsa jî baş lê nihêribû, ew xweha xwe ya berî bi panzdeh sal û çar–pênc mehan anîbû bîra xwe, dîtibû ko tu guhertin di xweha wî de çênebûne, ew spehîbûna xwe ya berî bi panzdeh sal û çend mehan hîna jî
parastiye.
— A îro min dergîstiya te dit. Wê got, ger tu herî silavên min lê bike, jê re bibêje, ez li benda wî me, ez ji wî pê ve kesî nakim, bila ew jî kesî neke. Wê dixwest bi min re were, lê nehat, wê got, jê re bibêje, bila ew were. Wê got, ma ne heqê min e ko ew were min bibîne. Min jê re got, belê, heqê te ye, ez ê herim kekê xwe bînim û werim. Ew niha haziriya me
dike, ew niha li benda me ye, çavên wê li riya me qerimî ne. De heydê kekê mino, heydê em herin.

Niha xweha wî çûbû ber pencerê, herdu destên xwe avêtibûn pencerê û ji birayê xwe re, yê ko dîsa hêsirên wî di ser riwê wî yê bi rih de diherikî re digot, »de haydê em herin«. Keçik di pencerê re derket û çû. Dengê wê
ji dûr ve di guhên mêrik de dikir zingînî: »Tu jî bide dû min keko, ez li benda te me!…«
Merik jî herdu destên xwe avêtin pencerê, hilkişiya ser û xwe bi dû xweha xwe de avêt.
***
Sibehê zû, gava mele ji mizgeftê vegeriya malê, ji dûr ve dît ko yek li kuçê dirêjkirî ye, kûçik û cewrikek li dora wî diçin û tên û lingên wî bêhn dikin.
Her ko mele nêzîktir bû, fêhm kir ko ew lawê cîranê wan e. Gava wî xwe avêtibû, pêşî li ser zik ketibû, paşê qulupîbû ser piştê. Nîvê riwê wî yê çepê nemabû, mêjiyê wî rijiyabû erdê. Melê ew çend mêşên rengkesk yên ko dikirin vingînî, dane alî û bi destmalka xwe riwê wî nuxumand.
14

Dilê şikestî
Ew saet sisê şevê hat malê. Hêdî, bêî ko kesî şiyar bike derî vekir û ket hundir. Tesîra vexwarinê ji ser wî çûbû, lê dîsa jî hebekî dihejiya. Wî bi wê hejandina xwe çakêtê xwe ji xwe kir, bi dar de kir û bêî ko lampê vêxîne derbasî odeya xwe ya razanê bû. Jina wî ya ko ji êvar de xew neketibû çavan; her li benda wî mabû û xwe bi derewan li xewê danîbû, bêhngirtin û bêhnberdana xwe jî mîna yeke ko di xeweke kûr de be, girt û berda. Mêrik jî bi fikira ko wê ji xew şiyar neke, hêdî pantolonê xwe ji xwe kir, paşê gomlek jî ji xwe kir û ew avêtin wê rasta odê. Dû re bêdeng xwe li ser nivîna, li paş jina xwe dirêj kir. Bi ketina mêrik ya nava nivîna

re, mîna ko jinik ji xewê şiyar bibe, xwe vezeland, bi derewa bawişkî û bi dilekî xerab ji mêrê xwe pirsî:
— Tu hatî?
Mêrikê ko bêhna araqiyê jê dihat û wê şevê qet dilê wî û munaqeşê tunebû, bi dengekî nizim got:
— Erê.
— Ma saet çend e?
Wextî mêrik derew bikira û saet şaş jê re bigota, lê gava çavên wî li saeta li ser masê, ya ko di tarîtiyê de sor dikir, ket, mecbûr ma rastiyê bibêje:
— Saet sisê ye.
Jinikê bi xwe dizanîbû ko saet sisê ye. Ji êvar de çavên wê ji wê saeta li ser maseya oda razanê neqetiyabûn.
— Tu heta niha li ko bû?
— Ez bîskê çûbûm mala Ehmed. Ji wir jî em çûn komelê.
— Ma komele heta vê saetê vekirî ye?
— Ma min got, komele?
— Erê, te got, komele.
— Na keçê, em neçûbûn komelê, em çûbûn mala Osman.
— Hûn çûbûn mala Osman?
Mêrik ji westandinê nizanîbû çi dibêje, ji xewê pê ve tiştek nedihat bîra wî. Wî dixwest kurt bibire û ji xwe re rakeve.

15

KEVOKA SPÎ

— Niha ez çûbûm ko, neçûbûm ko, ji te re çi lazim e?
— Çawa ji min re ne lazim e?
— Keçê dev ji min berde, ez bêxew im, ez ji xwe re rakevim.
— Tu bêxew î ne, çima na?

— Keçê, dev ji min berde! min ji te re got.
— Ez dev ji te bernadim. Te îşev çi kiribe divê tu ji min re bibêjî.
Mêrik bi kenekî ne ji dil got:
— Keçê, ma ez ê çi bikim?
— Tu dizanî tu çi dikî.
— Niha tu dikarî buhtanan jî têxî stûyê min.
— Na herê, melayiketên nola te dikarin çi bikin.
Mêrik dîsa kenekî ne ji dil, kenekî xav kir:
Bi wî kenê wî jinik qeherî, îcar bi dengekî hebekî bilind got:
— Ger tu ê vê bi min bikî, min bişîne welêt çêtir e. Ez hew dikarim îdare bikim, bes e ji derdê te!
Mêrik demekê xwe li razanê danî, lê nebû; gotinên jina wî yên bi hêrs û bi gazin qet firsend nedidayê ko razê. Wî bi xwe jî bi vê yekê zanîbû, loma bêî ko lampê pêxîne, destê xwe dirêjî ser maseya nêzîka qeryole kir, rahişt pakêta xwe ya cigarê, cigarek jê derxist, pêxist û çend hilmên kûr li ser hev lê xistin. Jinik li benda wî bû ko ew tiştekî bibêje, lê gava deng jê derneket, dîsa wê got:
— Ez zanim tu dîsa çûyî ba wê qehpikê, wê qehpika qûnmezin...Wê qehpika araqvexwir, wê qehpika ko nîvê bajêr bera ser xwe dide...
Mêrik bi sert peyva wê birî:
— Wek kûçikan mereye! Zimanê xwe weke yê kûçikan dirêj meke!
Jinekê jî bi hêrs bersiv da.
— Ger ne wilo be, bêje, ne
wilo ye!
Gava mêrik bêdeng ma, jinikê dîsa got:
— Erê, ma ne wilo ye?
— Na, ne wilo ye! mêrik bi hêrs got.
Jinik êdî baş hêrs bû, her tişt da ber çavan.

— Wê çaxê ez ê jî bi riya xwe de herim, wê bi dengekî bi bawerî got.
Mêrik fêrî wan gotinên wê bûbû, vê carê jî ew cidî negirt:
— Tu bi ko de dicehemî biceheme, got û berê xwe jê guhert da ji xwe re razê.
— Ez ji te re dibêjim, jinikê got. Ger tu dev ji van awayên xwe bernedî
16

ez ê herim. Ez hew deqîqekê li vê malê disekinim. Ez ê zarokên xwe bibim û herim.
Mêrik pir westiyabû, hêdî di ber xwe de got:
— Here...
— Ez ê herim, jinikê got, ji nav nivîna hol bû û lampe pêxist. Mêrikê ko xwe hê jî tevnelivandibû, dîsa hêdî di ber xwe de got:
— Keçê, vê şevê dev ji min berde...
— Ez ji te re rast dibêjim, jinikê bi dengekî bilind û nîvgirî got.
Bi dengê wê re zaroka wan ya biçûk ji oda kêleka wan giriya. Gava dengê zarokê hat mêrik, mêrik ji nav nivînê xwe rabû, şîmaqek bi hêz li ser çavê jinikê xist û hin çêr ji dê û bavê wê re kirin.
Di wê navberê de zarokên wan yên din jî rabûn, lê bavê wan bi ser wan de qîriya û zarok dîsa bi paş de çûne odên xwe.
Saet dihat çaran, tarîtiya şevê hêdî hêdî cihê xwe ji ronahiyê re dihişt. Mêrikê ko ji ser ya xwe danediket, kirinên xwe rast didîtin û li kesî din guhdarî nedikir, vê carê jî dixwest bi ya xwe bike. Lê jina wî jî, ya ko bi a wî gelekî bi înad bû, ji ser ya xwe danediket.
Wê her çiqas dizanîbû piştî sê zik zarok hevduberdan ne hêsan e jî, dîsa biryara xwe dabû, ko mêrik careke din vê yekê bikê, ew ê dev jê berde. Çend caran ew efû kiribû û mêrik jê re sond xwaribû, ko ew êdî hew tiştên weha dike. Lê wî tu caran sonda xwe bi cih netanî, piştî du-sê rojan

dîsa ji mal winda dibû. Tew carinan jê ew bi şev jî nedihat malê. Şevên ko dihat malê jî, mîna îşev saet di sisê, an jî çarê sibehê de dihat.
Mêrik cigareke din pêxistibû, li ser qorziya qeryole rûniştibû, serê xwe berjêr kiribû û difikirî. Jinikê jî herdu destên xwe xistibûn bin çengên xwe û li derve, li xaleke nexuyayî dinihêrî.
Paşê jinikê berê xwe bi mêrê xwe ve kir; serê mêrik hê jî di ber wî de bû û kûr kûr difikirî. Ji dilê jinikê dihat ko wî bide ber kêran û bikuje lê dikir nedikir nikarîbû jê nefret bikira. Her çiqas hin jinên hevalên wê ew şîret kiribûn û jê re gotibûn, dev ji vî mêrî berde jî, wê dikir nedikir ne dikarîbû dev ji mêr berdaya, ne jî gava mêr lêdixst, dikaribû li wî gilî bikira. Lê îşev kêr gihabû hestî, hatibû heta qirika wê. Ji xwe dilxerabiya ko îşev pê girtibû bûbû mîna gulokek mar û ketibû zikê wê. Ji dil bêtir zikê wê dêşiya. Hezkirina mêrê wê ya li hemberî wê keçikê, gotinên xweş ko ji keçikê re digotin, pê re razana wî, hemû dihatin ber çavên wê.
Gava ew li tiştên wilo difiki
rî dêhn dibû, aqilê xwe winda dikir. Vê carê jî wilo bû:

17

KEVOKA SPÎ

— Serê xwe mîna yê pîrekan nexe ber xwe, jinikê ji mêrê xwe re got û jê pê ve nizanibû wê çi bibêje.
Mêrik hêrs bû, lê wî jî tiştek negot, di cihê xwe bêdeng ma.
Jinik dîsa peyivî:
— Îcar ji te weye ew qehpik ji te hez dike? Ew qehpika ko nîvê bajêr bera ser xwe dide. Wê qehpika pîs û qûnmezin...
— Keçê bes e! mêrik got.
— Ne bes e!
— Bes bireye!

— Ez bes nakim! Divê îro her tişt safî bibe!
— De tu çi gûyî dixwî bixwe.
— Ji mala min here! jinikê got. Bi wê heramiya xwe nekeve nava nivînê min! Nivînê min neherimîne!
Mîna ko mêrik bi sûcê xwe hesiyabe, deng nekir. Lê jinikê rahişt pantolon û gomlegê wî, bi hêrs avêtin ser wî û got:
— Ji mala min here, here ba wê qehpikê!
Mêrik ji cihê xwe pengizî û rabû jinikê; kê dera wê kete ber wî, lêxist. Ne got çav e, ne dest e, ne serî ye, ne pişt e; hema ko dera wê diket ber wî, lêdixist.
Her ko wî lêdixist, jinikê jî dikir qîrîn û digot. Hersê zarokên wan şiyar bûbûn, hatibûn oda wan, ji tirsan xwe li hev pêçabûn û bi îskînî digiriyan. Ne haya dê, ne jî haya bavê ji zarokan çênebûbû, ew her bi hevdu re mijûl bûn. Nizanim çi li serê jinikê xistibû, serê jinikê şikandibû, ew xwîna ko ji serê wê dihat li ser kincên wê û li hundirê odê belav bûbû. Hîn ew wilo ji hev neqetiyabûn, hebe tunebe, wê cîranê wan ji polîsan re telefon kiribe, di demeke pir nêzîk de, otomobîla polîsan bi sureteke xurt hat, li ber deriyê wan sekinî û du polîsên dirêj, bi navmil, digel kûçikekî xurt û şiyar, bi lez xwe ji otomobilê avêtin û bi êrîş çûn hundir. Bi fikira ko belkî mêrik li hemberî polîsan rabe û tiştekî bi kar bîne, polîsekî demanca xwe jî kişandibû.
Lê mêrik li hember polîsan ranebû, mîna ko dizanibû wê polîs destên wî kelemçe bikin, herdu destên xwe dirêjî polîs kirin. Polisekî bi lez destê wî kelemçe kir, ew da pêşiya xwe û ew ber bi otomobîlê ve bir. Paşê yek ji wan polîsan dîsa bi paş de vegeriya hundir, herçiqas birîna jinikê ne birîneke xedar bû jî, polîs ji ambûlansê re telefon kir û heta ambûlans hat, pirsên ko ji jinikê pirsîbûn, di deftera xwe de not girtin.
18

***

Mêrik du mehan di girtîgehê de ma, meha sisiyan gava hat berdan, jinikê doza hevduberdanê lê kir û ew bi biryara mehkemê ji hev hatin berdan û zarok û xanî jî para jinikê ketin. Mêrik jî çû ba keçikê. Keçika ko ji bîst û du saliya xwe nuh ketibû bîst û sisiyan li nexweşxanê hemşîretî dikir. Meha pêşî gelekî xweş bi hev re derbas kirin, gelekî ji hev hez dikirin... Ji kêfa evîna hevdu re herdiwan jî hefteyekê ji cihê karê xwe îzin girtin û bi hev re çûn Lanzeroteyê. Ew bi şev û roj ji hev têr nedibûn. Ji çend saetên xwarinê û ketina avê ne têde, wekî din ew her bi hev şa dibûn, hevdu mist
didan, bi hev re radizan.

Ne rojek, ne du roj, ne sê roj, wextê wan hefteyekê her wilo bi kêf, bi zewq, bi evîn û xweş derbas bû. Piştî ko ji tatîlê vegeriyan bi hefteyekê jî têkiliyên wan wilo xweş bûn. Lê êvarekê gava keçik ji kar hat malê ne wek hertim bi kêf bû. Gava mêrik xwest wê hemêz bike û maçî bike, keçikê bi sarî ew maçî kir, cara didiwan wê berê xwe jê guhert. Sarbûna keçikê tavilê bala mêrik kişand. Lê berî ko mêrik tiştekî bibêje, wê got:

— Divê tu ji xwe re xaniyekî bibînî. Ez dixwazim bi tenê bimînim.

Mêrik sar ma. Te heft xencer lê bixista piça xwînê jê nedihat.

Ev çi bû îcar? Ma ne wan ji hev re soz dabûn, ko ew ê bi hev re bimînin û sala bê jî bi hev re herin Krêtayê, li wir destgirtî bibin û li wir du hefteyên xweş û bi şahî bi hev re derbas bikin. Ma qey keçikê ev hemû tişt
ji bîr kiribûn?

Du-sê rojên din jî bi hev re man, lê ji hev gelekî sar, an jî keçik jê gelekî sar bû. Her çiqas mêrik dixwest wê hemêz bike an wê maçî bike, keçikê xwe bi paş ve dikişand an jî carê ji xwe re mijûliyek peyda dikir da ko ji

mêrik rizgar bibe. Di hundirê wan du-sê rojan de jî tenê carekê bi hev re razan, ew jî ne ko jinikê dixwest, hema hema bêjin bi zorê bû.
Gava mêrik xwe da erdê û nexwest ji mala keçikê bar bike, keçikê jê re du roj mudet da û got ko ew vê carê bar neke ew ê ji polîsan re telefon bike û dê wî bi zorê ji malê derêxe. Ji ber ko mêrik gelek salan li Swêdê mabû û bi qanûnên Swêdê û azadiya jinan dizanîbû, ji xwe re zû ji destê dudan xaniyekî xwendevanan peyda kir û barkirê. Lê piştî ko bar kir jî her keçik azad nedihişt; bi roj bûya, bi şev bûya, ji keçikê re telefon dikir û her carê ko telefon dikir jî nêzîkî nîvsaetê dipeyivî. Her çiqas ji keçikê re digot: »çawa hezkirina te wilo dawî hat?« bersiva ko keçikê didayê jî her
»ez dixwazim bi tenê binînim« bû. Ji bo ko keçik jê pak bibe û êdî hew dengê wî bibihîze, wê nimra telefona xwe jî guhert. Vê yeka han tesîreke
19
KEVOKA SPÎ

ecêb li mêrik kir, dinya bi ser wî de hilşand. Her tişt li ber çavên wî reş bûn. Du sê rojan zor da cigarê û vexwarinê; hefteyekê neçû kar; dikir nedikir keçik ji bîrê nediçû.
Rojekê, danê nîvro gava li otobusê siwar bû, dît ko destê keçikê di destê xortekî ji Emerîka Latînî de ye û li ber camekana dikanekê rawestiyane û li kincan dinihêrin. Heta otobus li kuçê zîvirî jî wî di ser stûyê xwe re li wan nihêrî.
Heya bi çar pênc mehan bi zorê wî hebekî ew keçik ji bîr kir. Lê tenêtî çiqasî nexweş bû. Bi tenê razê, bi tenê rabe. Bi tenê bixwe, bi tenê vexwe. Carinan jê wî bi saetan xwe li ser nivînê xwe dirêj dikir, çavên xwe bera nixteyekê didan û wilo bêdeng dima. Ger wilo dom bikira ew ê şerpeze û dîn bibûya.

Şev nîvê şevê rabû ji kevnejina xwe re telefon vekir. Jinik bi dengê telefonê ji nava nivînan pekiya û bersiv da:
— Elo…
— Elo, ez im…
— Xêr e tu vê şevê telefon dikî?
Her çiqas panzdeh salan bi hev re mabûn jî, dîsa wan çend mehan ew ji hev bi dûr xistibûn; mêrik nikanîbû mîna berê serbest pê re bipeyiviya. Vê carê lawik kir sebeb:
— Min dixwest ez bi Temo re bipeyivim:
— Temo niha razaye û wê sibehê zû rabe here mektebê, tu dikarî sibehê piştî mektebê telefon bikî. Şev baş!
Jinikê telefon di rûyê wî de girt. Ev yeka han pir li zora wî çû, lê neda xuyakirin. Bîskekê xwe li ser nivînê xwe dirêj kir, paşê cigarek pêxist; piştî ko cigara xwe kişand, dîsa telefon vekir.
— Keçê qet nebe em bîskê bipeyivin.
— Em ê çi bipeyivin? jinikê got.
— Li ser rewşa me
— Rewşa çi?
— Ma nabe ko em dîsa werin ba hev?
— Ez niha rehet im, dev ji min berde.
Erê jinikê wilo got, lê qet nebe ji bo zarokan bûya jî wê dixwest careke din bigihên hev.
— Keçê meriv carekê şaşiyê dike.
Jinikê dizanibû ko ew niha hewcedarî wê ye. Gava yek zeyif dikive, yê din xurt dibe. Jinikê jî xwe di wê deqîqê de pir xurt û bi hêz hîs kir.
20

Wê şevê belkî zêdeyî saetekê bi telefonê bi hev re peyivîn. Her çiqas

mêrik xwest wê şevê here malê, yanî here mala jinikê jî, lê jinikê nexwest û piştî wê bi du rojan bi alîkariya hin malbatên din ew dîsa li hev hatin. Ne ji wan bêtir be jî, bi qasî wan zarokên wan jî kêfxweş bûn.
Bi xwestina jinikê wan ji wî bajarî bar kirin û çûn li bajarekî din bi cih bûn. Mêrikê ko bi xwe hem li welêt, hem jî li Swêdê mamoste bû, dev ji mamostetiyê berda, bi hevalekî xwe re ko ew jî li welêt avûkat bû, lê li Swêdê li ser sosyalê dijiya, restorantek vekirin. Restoranta wan ko îro yek ji restorantên bajêr ya herî baş e, bi xwarinên xwe yên kurdî navdar e.
21
KEVOKA SPÎ

22

Şeva sersalê
Berî şeva sersalê bi hefeyekê, hevalekî Alan jê re telefon kir û xwest ji bo pîrozkirina sersalê bi hin malbatên din re li malekê li hev bicivin û ji xwe re şeveke şahiyê çêbikin.
Herçiqas Alan li ser riya Parîsê bû û bilêta xwe ya çûyîn û hatinê birrîbû jî, dîsa hevalê wî ew ji rê bir û nemaze ji bo ko wê Metîn Cansever jî beş-darî şeva şahiyê bibûya, xwest ko Alan jî ji wê şevê nemîne û ji salê carekê şeveke wilo xweş û bi reng bi hev re pîroz bikin.
Alan bi xwe navê Metîn Cansever çend carên din li hin cihên din jî bi-hîstibû. Lê li her cihekî bi awayekî behsa wî hatibû kirin. Ji bo Alan firsenda dîtina vî kesî nerevîne û qet nebe bi nas û hevalên xwe re di şeveke wilo de li hev bicivin, hema bi lez bilêta xwe ya balafirê, digel ko hinek pereyên Swêdî zêde bide vegerand, piştî wê bi rojekê bi telefonê li hevalê xwe geriya û ji bo beşdarbûna xwe ya şevê ew haydar kir. Hevalê wî yê ko ji eynî bajarî bû û li welêt muhendîz bû, lê li Swêd di restoran-

tekê de firaxşoyî dikir û wextê xwe yê vala bi çêkirina resiman ve derbas dikir, bi nûçeya ko wê Alanê beşdarî şeva şahiyê bibe, pir kêfxweş bû. Êvara sersalê nêzîkî panzdeh kesan li mala hevalê Alan civiyan. Digel ko piraniya beşdarên şevê navsal bûn jî hê ew nezewicî bûn. Jinên du hevalan jî weke her sal îsal jî çûbûn welêt. Ji jina mazûbên û du keçikên swêdî pê ve tu jin tunebûn. Ew herdu keçikên swêdî jî hevalên du beş-darên civînê bûn. Lê ew zêde neman, hîn berî ko Metîn Cansever were, wan xatir ji hevalên xwe xwestin, li ser lingan tiştin ji hev re gotin û çûn. Metîn Cansever piştî hemiyan hat. Qatek kincên reş û gomlegekî spî li xwe kiribû, qerewata reşbelek bi ser de girê dabû û hê ji dûr ve bêhneke xweş jê difûriya. Piştî ko silav da civatê û ji bo derengmayina xwe ji nas û hevalên li wir uzra xwe xwest, bi nermî xwe da ser kursiyê.
Lixwekirin, nazikî û kubariya Metîn Cansever tavilê bala Alan kişand. Loma, bêî ko ew haya kesî bigihînê, wî xwe nêzîkî Metîn Cansever kir û hêdî çû û li ba wî rûnişt.
Piştî ko hemiyan bixêrhatinî dan hev, xwe bi hev dane naskirin û bi
23
KEVOKA SPÎ

noşîn çend qedeh li hev xistin, Metîn Cansever hêdî di ser stûyê xwe re zîvirî û bi dengekî nizim ji Alan pirsî:
— Ma xorto tu zûde hatiyî Swêd?
Alanê ko qet nebe bi sê-çar salan ji Metîn Cansever mezintir bû, bi nazikî bersiva wî da:
— Piştî du mehên din deh salên min têne dagirtin.
Metîn Cansever rahişt qedeha xwe ya şerabê, bilind kir, lê nihêrî, du-sê gulp jê vexwar, lêva xwe ya jêr mêt, serê xwe hinekî hejand û bi axînkişandineke bêdeng dîsa ji Alan pirsî:

— Tu qet neketiyî, tu çend salî yî?
— Ez çil û sê salî me, Alan got.
— Pirs ne eyb be tu çend salî yî?
— Yê min tu lê nepirse.
Metîn Cansever dîsa rahişt qedeha xwe, vê carê li ya Alan xist, tiştê ko di qedehê de mabû bi ser xwe dakir û ji Alan pirsî:
— Tu çi karî dikî?
— Ger kar bête hesab, ez rojnamevan im, Alan got.
Metîn Cansever dîsa qedaha xwe dagirt, qurtek jê vexwar û bi dengekî nizim peyva xwe domand:
— Min jî demekê rojnamevantî dikir, lê karê doktoriyê ez li paş hiştim. Niha xebata min li ser romanekê heye. Roman li ser jiyana romantîkekî kurd e, ko di sedsala nozdehan de jiyaye û ji malbateke ronakbîr û têgi-hiştî ye. Min roman bi kêmanî deh caran nivîsandiye û xerab kiriye. Tam deh salên min girt. Lê çi fêde, roman derkeve jî kurd jê fêhm nakin. Ji bo têgihiştina romaneke wisa kultureke bilind lazim e. Lê tu a rastî bixwazî, ez vê ne ji bo kurdan dinivîsim, min bêtir berê xwe daye Ewrûpiyan. Ji xwe berî kurdiya wê, dê ji aliyê du hevalên min yên nivîskar bi fransî û îngilîzî derkeve.
Hevalê Alan yê ko li kêleka Metîn Cansever rûniştibû, herdu guhên xwe miç kiribûn û li sohbeta wan guhdarî dikir. Gava Metîn Cansever li vê yeka han hayî bû, xwest peyvê dagerîne ser tiştekî din, lê mazûbên bi ken jê pirsî:
— Ka ew pirtûka te derneket lo?
— Na welle, hê derneketiye. Mîratê xebateke dûr û dirêj jê re divê. Ji bo bidestxistina hin delîl û malûmatan divê ez herim Misrê û Sûriyê. Lê destên min ne vala ne, wergerandina hin klasîkan di destên min de hene. Ez niha bi wergerandina Tolstoy û Dostoyevskî ve mijûl im.

24

Her ko şev derengtir dibû, hewa sohbetê ewçend germtir û xweştir dibû. Li ser masa mitfaxê û ya oda rûniştinê tije xwarin û vexwarinên pir-texlît bûn. Hemiyan bi kêf dixwarin, vedixwarin, dipeyivîn, dikeniyan. Û cigare… Wan cigare ji cigarê pêdixistin. Wilo bûbû ko ji dixana ciga-ran çavan çav nedidîtin. Ji bo hênikkirina hundir û ji dixanê pakkirina odê çend caran pencere vekirin jî, lê dîsa ji ber nexweşiya Metîn Cansever tavilê girtin.

Bi lêdana saet donzdehan wan şûşeyeke şampanya vekirin. Yê ko şûşe vekir mirovekî navsal, bejindirêj, hebekî rûdagirtî, porspî û ji der û dora Diyarbekirê bû. Bi saloxan, wî di dema xwe de bingeha partiyekê avêtibû û di partiyê de jî karekî girîng girtibû ser xwe. Ew du-sê caran jî hatibû girtin, lê dîsa zû hatibû berdan. Li gora hevalên ko ew nasdikirin, spîbû-na porê wî ne nîşana biaqiliya wî bû

Piştî ko wî qedehên hemiyan dagirt û bi noşîn qedehên xwe li hev xistin, wî destekî xwe xist bêrîka xwe, destê din jî danî ser masê û peyivî:

— Gelî hevalan, lihevkombûna me ya îşev rojek ji rojên welêt tîne bîra min. Ew rojên xweşiyê, yên şahiyê. Lê şîreta min li we, ji siyasetê bi dûr bikevin. (Destê xwe danî ser porê xwe) Min ev por di siyasetê de spî kiriye. Min tam bîst salên xwe dane siyasetê. Ka min çi kir? Ka çî min heye?

Xortekî ko li quncikê rûniştibû û ta bi wê deqîqê deng jê derneketibû, rabû ser xwe û xwest peyva wî bibire, lê xwediyê malê çav dayê û ew da rawestandin.

Mêrikê diyarbekirî her got. Ew geh hêrs dibû, bi dengekî bilind dipeyivî, geh jî dengê xwe dadixist, nerm dibû û bi bergerîn digot. Wilo bû ko êdî hew kesî guh dayê. Hinan gotin: »Serxweş e, dev jê berdin, çi

dibêje bila bibêje«. Hinek jî rabûn, xwestin bi milên wî bigirin û wî bavêjin der, lê dîsa xwediyê malê nehişt û ew dane rawestandin. Pir tê re neçû, mêrikê me yê Diyarbekirî xwe li quncikeke xênî avêt erdê û hema li wir di xew re çû.
Metîn Cansever jî êdî ji şerabê derbasî wîskiyê bûbû. Qedeha wî ya wîskiyê di destê wî de bû û li ber tabloyeke Picasso, Guernica, ya ko xwediyê malê ji afîşekê çarçive kiribû û bi dîwêr ve kiribû, rawestiyabû û kûr kûr lê dinihêrî.
Wê yeka han dîsa bala Alan kişand, wî jî rahişt qedeha xwe, rabû û çû ba Metîn Cansever.
— Çi ji Picasso dikeve serê te?

25

KEVOKA SPÎ

— Picasso hosteyekî nemir e. Ne kesî berî wî mîna wî xweş çêkiriye, ne kes dikare piştî wî mîna wî xweş çêbike.
— Navbera te û Salvador Dali çawa ye?
— Digel hebekî dînbûna wî û têkiliyên wî yên bi Lorca re, dîsa jî ew surealîstekî xurt û mezin e.
Alanê ko qet nebe hin klasîkên dinyayê xwendibûn, di wê deqîqê de xwe li ber Metîn Cansever pir biçûk û nezan dît. Wextî di dilê xwe de bigota »bi rastî va ye întelektuel ji nava me derdikevin« lê weke Metîn Cansever di dilê wî de be, peyv jê girt:
— Lê, pismamê Alan, ka ji me çi derketiye?
Dîsa berê xwe bi tabloya Picasso vekir
— Ka kî ji me dikare tabloyeke wisa çêbike?
Hebekî sekinî, dîsa got:
— Ka kî ji me dikare mîna Franz Kafka binivîsîne?

Wext bûbû derengê şevê, digel derengiya şevê, dîsa civatê kaseteke govendê danîbû ser, bi besteke xweş û bi dilşahiyeke mezin dîlanên kurdî digirtin. Yên ko nedireqisîn jî, bi stran û çepikên xwe govend geş dikirin.
Xuyabû ew vexwarina ko Metîn Cansever ji êvar de vedixwar tesîr lê kiribû. Ne ko serxweş bûbû, lê zêde dikeniya, zêde dipeyivî û her behsa muzîk û edebiyata dinyayê û behsa modernîzmê dikir. Paşê ji nişka ve li govenda geş zîvirî û bi dengekî bilind got:
— Hela bes e bavo, we xwe kuşt!
Lê govendê her bi ya xwe kir.
Paşê ew li xwediyê malê zîvirî:
— Ka tu ji kereme xwe re ji me re muzîkeke klasîk deyne ser; Mozart, Bethoven…
Wextî xwediyê malê bigota, ev hewa ne ya muzîka klasîk e, lê dîsa jî ji bo ko dilê wî nehêle, ji mêvanên xwe yên din destûr xwast û sêlikeke Mozart ya ko di erzaniyê de kirî bû, da ser.
Xuya bû wê sêlikê dawiya şeva wan a şahiyê tanî. Hem ji ber derengbûna şevê û tesîra vexwarinê, hem jî ji ber ji bo wan nexweşbûna wê muzîkê, di wê bîskê de çend heb ji wan bawişkîn.
Metîn Cansever jî kirî di xew re biçûya, lê ji bo ko di çavên beşdarên şevê de kêm nekeve, bi alîkariya herdu destên xwe rabû ser xwe, yek bi yek destê xwe da wan, destûra xwe û çûyinê ji wan xwest û ber bi derî ve meşiya.
26

Alan û hevalê xwe jî pê re çûne ber derî. Metîn Cansever hêdî, bi cangiranî paltoyê xwe li xwe kir, pêlavên xwe xistin pê û bîskê jî li ser lingan peyivîn. Paşê, berî ko derkeve, destê xwe da xwediyê malê, destê wî bi

dostanî guvaşt, spasên xwe ji bo şevê jê re got û hin rexne jî li organîzekirina şevê girt. Li gora ko xwediyê malê Metîn Cansever nas dikir, ew rexneyên wî gelekî normal dîtin û bi devkenî ji bo sersala bê, soza organîzekirinek baştir dayê.
Metîn Cansever di wê navê de hejiya û wextî biketa, lê Alan bi lez ket bin milê wî.
— Haa, min wextî tu ji bîr bikira, wî bi dengekî mîna yê serxweşan ji Alan re got. Tu ket serê min. Tu xortekî jîr û zîrek î. Binivîsîne, lê nûjen binivîsîne! Dev ji tiştên kevin berdin, bibin Ewrûpayî. Metîn Cansever bi wî awayî hejiya, derket û çû.
Ew berfa hûr û bayê xurt yên ko ji êvar de dihatin, êdî dawî hatibû û cihên xwe ji berfa gir re hiştibûn. Kuliyên berfê li ber şewqên lampên kuçan weke minminîkên spî li ba dibûn.
Metîn Cansever stûkura paltoyê xwe bilind kiribû, herdu destên xwe xistibûn bêrîkên xwe, di nava kuliyên berfê de bi hejandin dimeşiya û di ber xwe de stranek digot:
Hatasýz kul olmaz
Hatamla duy beni
Dermansýz derd olmaz
Derdimle duy beni
27
KEVOKA SPÎ

28

Doktor Sertaç
Berî hevdîtina Doktor Sertaç û mamosteya unîversîteyê ya fakulteya edebiyatê Perwînê bi rojekê, Dr. Sertaç ji bo kirîna qatek kinc saet ji nehê

sibehê heya bi çarê piştî nîvro bêî ko raweste û bêhna xwe berde, li dikan û mixazeyên Diyarbekirê geriya. Ew diçû kîjan dikanê jî nîvê qatên kincên wan li xwe dikir û ji xwe dikir. Rebeno ne mexsûs wilo dikir, bi rastî jî tu kinc lê nedihatin; hemû an jê re teng bûn an jî dirêj bûn. Qatê dawî ko li dikana dawî li xwe kir, hebekî lê dihat lê rengê wî rengekî pirr ecêb bû, kêfa Doktor qet ji wî rengî re nehat. Bi niyeta belkî biecibîne çend caran li ber neynikê çû û hat jî, dîsa nekete serê wî, ew rengê mîna xweliyê qet ew venedikir.

Piştî ko wî çakêt ji xwe kir, ji dikandêr pirsî:

— Qatekî din di vê mezinahiyê de, lê rengekî din tuneye gelo?

Dikandarê ko temenê wî li dor bîstî bû, bejinzirav, dirêj û zerik bû, carekê du caran di ber qatên kincan re çû û hat, paşê ji Doktor Sertaç re got:

— Belê Welle, gerek qatekî din jî di wê mezinahiyê de hebûya, ger şansê te hebe ew ê nehatibe firotin.

Dikandar li wî qatê kincan geriya negeriya nedît. Lê dû re qatekî din ji nava kincan kişand, dirêjî Doktor Sertaç kir û got:

— Ev bi du numreyan jê biçûktir e. Lê ev malê Îskoçya ye. Numrên îskoçî carinan ji yên me mezintir in. Ka tu ji kerema xwe re vî li xwe bike, dibe ko li te bê.

Doktor Sertaç ew qatê kincan ji destê dikandar girt û bi cangiranî li xwe kir. Rengê qêt xweşik bû, lê qet lê nedihat; wî ne dikarîbû bişkokên çakêt bigirtana, ne jî bişkokên pantolon. Doktor Sertaç bi eynî cangiraniyê ew jî ji xwe kir û da dikandar.

Ji westandinê ew êdî nikarîbû li ser lingan rawestiya; li ser kursiya dikandar rûnişt û bi destmalka xwe ya kaxezî xwêdana ser çavê xwe û ya eniya xwe ya rût pakij kir.

Doktor Sertaç yekî kurt û dagirtî bû. Ji dagirtîbûnê jî wêdetir qelew bû.

29

KEVOKA SPÎ

Li gora hevalekî wî ko ji min re behs kiribû, ew du caran ji bo wê qelew-bûna xwe emeliyat bûbû, lê dîsa jî fêde nekiribû. Piştî emeliyata dudan ji ber sedemin nenas îcar porê wî weşiyabû. Ji ber weşandina porê xwe wî qelewbûna xwe ji bîr kiribû.

Piştî ko dikandar ew hemû kincên ko ji bo wî derxistibûn bi dar de kirin, kirî erza wî bişikanda û bigota: »Ma ev der çayxane ye ko tu li vir rûdinî« lê Doktor Sertaç berî wî peyivî:

— Min digot belkî karê doktoriyê tenê zehmet e, karê we jî ne rehet e.

Gava dikandar têgihîşt ko ew doktor e, bi nermî û bi devkenî jê pirsî:

— Ma tu tiştekî venaxwî, çayekê an tiştekî sar?...

— Belê Welle, tu ji kerema xwe re ji min re coca-colayekê bixwaze.

Dikandar bi dostanî destê xwe li paş stûyê lawikê şagirt ko temenê wî li dor deh salan bû û ji dirêjbûna porê xwe bêtir li keçikekê çûbû, xist û ji bo xwastina coca- colayê ew şand çayxaneya herî nêzîk.

Lawik zû digel coca-cola û qedehekê vegeriya û ew li ser masê, li ber Doktor Sertaç danî.

Doktor Sertaç coca-colaya xwe berda qedehê, qedeh nîvî kir û hinek jê vexwar.

Paşê li saetê nihêrî; saet dihat çaran. Piştî çend saetên din wê piraniya dikanên kincan bihatana girtin. Lê diviyabû Doktor Sertaç ji xwe re qatek kinc bikiriya. Ji ber ko çi cara wî û mamosteya fakulteya edebiyatê Perwînê hevdu dîtibûn, her carê ew kinc lê bûne. Loma wî biryar dabû ko vê carê bi qatek kincên nû û xweşik derkeve hemberî Perwînê.

Piştî ko wî vexwarina xwe vexwar, ji dikandêr pirsî:

— Wekî din tu mixaze li van nêzîkan tuneye gelo?

Dikandar cihek got, lê dûr bû, li aliyê bajêr ê din bû.
Doktor Sertaç rabû ser xwe û dîsa di ber kincan re çû û hat; destê xwe dirêjî qatekî kir û ji dikandar pirsî:
— Gelo min ev jî li xwe kiribû?
Dikandar çû ser kursiyê, ew qatê kincan ji jor daxist, hêdîka ew toza ko lê girtibû dawşand û dirêjî Doktor Sertaç kir. Doktor Sertaç ew qat jî mî-na qatên berê di pişt perdeyeke biçûk de li xwe kir, ji pişt perdê derket, di
ber neynikê re çû û hat; piştî ko baş li paş û pêşê xwe nihêrî, di ber xwe de
kir niçe niç û got:
— Ev tam li gora min e, lê milên çakêt dirêj in.
Dikandar bişkokên çakêt girtin, milên çakêt bi qasî ko dirêj bûn lê wergerandin û piştî ko du-sê caran li dora wî zîvirî û lê nihêrî, got:
30

— Milên wî ne tê de lê wekî din tam li gora te ye. Ger tu bixwazî, terziyekî me heye, ez dikarim lêwik bişînim ba wî, ew ê ji te re di nîvsaetê de milên wî lê wergerîne û tu qet ferq jî nakî.
Ew yeka han ket serê Doktor Sertaç, bi kêf, lê bi cangiranî ji xwe kir û da dikandêr. Dikandêr jî ji lawikê şagirt re tarîf kir, jê re xist kîsikekî nay-lon û ew şand ba terzî.
Saet li dor çar û nîvan lawik ji ser terzî vegeriya. Xortê dikandar ew xweşik pêça, xist kîsikekî nû û ji Doktor Sertaç re danî ser masê.
Doktor Sertaç rabû ser xwe, dîsa bi destmala xwe ya kaxizî xwêdana ser çavê xwe û ya eniya xwe ya rût pakij kir, paşê destmala xwe xist bêrîka xwe
ya hundir, cûzdanê xwe derxist, buhayê ko dikandar jê re gotibû, bêî ko

bazar bike pere hejmartin destê wî, rahişt qatê kincên xwe, bi devkenî xatir ji dikandar xwest, derket û çû.
***
Ji ber ko ew êvarî her li Perwînê fikirîbû û dereng raza bû, adinî rojê dereng ji xew rabû. Hûn ya rastî bixwazin, razana wî bi tenê ew çend saetên dawî bû. Heta saet sisê sibehê, ew bi kêmanî şeş caran şiyar bûbû û her cara ko şiyar bûbû jî, hem li saetê nihêrîbû, hem jî çûbû daşirê avek rijandibû.
Ji bo ko miriyê xewê bû û ji tirsa ko ew ê di xew de bimîne, bi tas û was nivistibû, her xewn dîtibû. Ji bilî xewna ko wî di emeliyatê de bi şaşî nexweşekî xwe dikuşt, xewna Perwînê jî dîtibû. Dîtibû ko mamosteya fakulteya edebiyatê Perwînê, destê wê di destê mamosteyekî fizîkê de ye û di nav daristaneke bê ser û dawî de mîna du zarokên dilşa dibezin. Di xewnê de gelekî dilxerabî pê re çêbûbû, lê gava wilo dereng, saet yanzde-han ji xew rabûbû û dîtibû ko xewn e, bêhna wî hatibû ber wî û ji ber ko dilxerabî mirovan biçûk dike, ew ji ber wê xewna xwe hebekî li ber xwe jî ketibû.
Li gora lihevkirina wî û Perwînê, wan ê li mala Doktor Sertaç hevdu bidîtina. Herçiqas Doktor Sertaç xwestibû wê biezimîne restorantekê û li wir xwarinekê bi hev re bixwin jî, lê Perwînê li hember derketibû û bi fikira ko ji diyarbekiriyan re nebe mijara kurt û pistê, wê mala Doktor Sertaç çêtir dîtibû û ji bo wê hevdudîtinê jî pêwîstiya tu xwarinê nedîtibû. Doktor Sertaçê ko ne bi dilekî lê bi heft dilan dil ketibûyê, dîsa jî li gora germa Diyarbekirê hê ji doh de hin xwarinên sivik amade kiribûn, ser

wan naylon kiribûn û ew di sarincê de bi cih kiribûn.

Saet ta bi donzdehan jî hê Doktor Sertaç xurîniya xwe nekiribû. Wî ne bi tenê xurîniya xwe nekiribû, herweha ne riha xwe kurr kiribû, ne jî mî-na ko her sibeh dikir, serê xwe şuştibû.
Saet donzdeh û pênc deqiqeyan rabû ser xwe, ji navê û bi jor ve tazî û bi zikê xwe yê ko weke merşekê pê ve daliqyabû, çû daşirê, piştî ko ji daşirê vegeriya, deriyê sarincê vekir, qutîka şîr bi ser xwe da kir, ji ber ko devê qutîkê bêduzen vekiribû, hin ji şîr rijiya ser wî, ew şîrê ko bi ser wî de rijiya, herikî ser zikê wî yê mezin û di ser zikê wî re jî dilop bi dilop niqutî erdê.
Doktor Sertaç bi hêrs ew qutîk xist sarincê, bi piste pist xeberin da û bi paçikekî ew şîrê ko rijiyabû erdê pakij kir.
Ji do êvarî de nihêrîna saetê jê re bûbû wek nexweşiyekê, dîsa li saetê ni-hêrî,
— Wextê me hê pir maye, wî di ber xwe de got.
Û weke ko ji nişkê ve pirsek an jî tiştek hatibe bîrê bi lez ber bi pirtûkx-ana xwe ve çû, pirtûkek stûr û bi reng ya di derheqa tibbê de bû ji nava refên pirtûkan kişand, li ser linga pelên wê di ser hev re qulupandin, nêzîkî li nêvî kir, li wir tiştin xwend û paşê ew pirtûk dîsa bi paş de xist ci-hê wê. Lê îcar ansîklopediyeke ko bi tîpa »K« dest pê dikir ji nav pirtûkan kişand, li ser dîwanê rûnişt û pelên wê jî di ser hev re qulipandin. Wî tu carî bendek an jî stûnek bi temamî nedixwend. Hûn ya rastî bixwazin, ji xwendinê bêtir, ji bo ko ew wextê xwe derbas bike wî li wêneyên pirtûkê dinêrî.
Saet çar û nîvê piştî nîvro, gava li deriyê Doktor Sertaç ket, wî hê xwe hazir nekiribû. Baş bû yê ko li derî xist ne Perwînê, lê parsekekî kal, ri-hdirêj û pişttewiyayî bû. Doktor Sertaçê ko bi kurkirina riha xwe ve bilî bûbû û gwîzan li cênîka xwe ya çepê xistibû, bêyî ko bihêle Kalo zêde bipeyive û duan bike, du pelên kaxizî ji çavîka masê kişand û xist mista

kalo.
Kaloyê ko herdu çavên wî mîna du morîkên hêşin di nava wê riha wî ya spî de diçûrisîn, bi dua û selewatan ji mala Doktor Sertaç bi dûr ket.
— Em ji derdê van parsekan mirin, Doktor Sertaç di ber xwe de got. Diyarbekir bûye cihê parsekan.
Paşê dîsa çû serşokê û bi kurkirina riha xwe ya ko nêvcî mabû ve mijûl bû. Bi gwîzanê ko berê pê cênîka xwe ya çepê birî bû, vê carê jî nizanim çawa kir, qirika xwe birî.
32

Ji ber senhetê xwe û şarezabûna xwe ya birînkewandinê, Doktor Sertaç tavilê bi derman û pembo ew xwîna han da rawestandin. Lo heya ko wî riha xwe kur kir, ew ji hal de ket.
Her carê ko wi gwîzan li riwê xwe dixist, ji ber kobûna gwîzên, çêr û xe-berên dinyayekê dikir. Ji ber wê yekê, ew gelekî poşman bûbû ko ew neçûbû ser berber.
Gava dawiya kurkirina riha xwe anî û çavên wî li saetê ket, saet bûbû pêncê piştî nîvro. Wextê ko wî û Perwînê dabûn hev jî, di navbera pênc û pênc û nîvan de bû.
— Normal gerek ew di pênc û nîvan de were, Dokto Sertaç xwe bi xwe got.
Û bi rastî jî mamosta Perwîn tam di pênc û nîvan de li deriyê wî xist. Doktor Sertaç bi pantolonê xwe yê nû, bi kêf, lê hebekî bi heyecan derî vekir. Mamosta Perwîn weke hercar vê carê jî desteyek kincên sivik li xwe kiribû. Kincên wê ji yên jinekê wêdetir weke yên mêrekî bûn. Wê bi wî awayî solên xwe ji pê kirin û ji tûrikê xwe, ko mîna tûrikên şivanan bû û bi sê gulîkên bi sê rengên cihê; kesk, sor û zer pê ve daliqyabû, pirtûkek derxist û diyarî Doktor Sertaç kir. Doktor Sertaçê ko eslê wî ji Xarpêtê bû

û ji malbata Şêx Seîd bû qet nedixwest xwe siyasî nîşan bide. Lê dîsa jî ji bo xatirê Perwînê ew pirtûk bi kêfxweşî girt, bi kêfxweşî spasên xwe jê re gotin, bi hev re derbasî odeya rûniştinê bûn û Doktor Sertaç ew li cihê herî xweş da rûniştandin.
Bi rûniştinê re wê çavên xwe li hundirê odeyê û li wêneyên dîwêr gerandin. Gava çavên wê li ser pirtûkxanê li wêneyekî Mustafa Kemal ket, hebekî ecêbmayî ma, lê dîsa jî ew ecêbmayîbûna xwe bi Doktor Sertaç neda xuyakirin. Wê Doktor Sertaç jî bi wê yekê hesiyabe, loma piştî bi nivsaetekê di nav sohbeteke li ser lingan, ew guldanka kirîstal a li ser pirtûkxanê bi dizîka kişande ber wî wênekê Atatürk ê biçûk. Ancax piştî demeke dirêj mamosta Perwîn ew yeka han ferq kiribû.
Sohbeta wan ya pêşî li ser nexweşxanê û doktoran, paşê jî dageryabûn ser dibistanê û rewşa mamosta û xwendevanan. Ne li ser sîstema nexweşxanê, ne jî li ser sîstema dibistanê Doktor Sertaç û mamosta Perwîn li hev nedikirin. Herweha wan li ser sîstema welêt jî li hev nedikirin. Mamosta Perwîn digot, divê partiyeke kurdî ava bibe û ew partiya kurdî bikaribe di parlemanto de doza mafê gelê kurd bike. Û wê digot, ji ber ko kurd bêtir bi rewşa xwe dizanin, ew ê baştir bikaribin pirsên xwe jî çareser bikin.
33
KEVOKA SPÎ

Doktor Sertaç li dijî wê nêrîna mamosta Perwîn derdiket û digot ger ji bo kurdan musade were dayîn ew ê sibe ereb jî, çerkez jî, asûrî ji, ermenî jî, gurcî jî doza vî mafî bikin û ger bi vî awayî here ew ê Tirkiye hilweşe û ew ê Cumhuriyeta ko li ser heqiyê ji aliyê Kemal Atatürk ve hatiye li-darxistin, nemîne û bi vê yekê ew ê tenê kêfa emperyalîstan were. Carinan jê jî gava têdigihîşt ko mamosta Perwîn ji wan peyvên wî aciz

dibe wî xwe hebekî nerm dikir, ji fikir û nêrînên xwe yên salan digeriya û pirrê caran mamosta Perwîn biheq didît. Û hema piştî wê jî jê re digot, bê ew çiqasî ji wê hez dike. Wê jî digot, ko tu niyeta wê û zewacê tune ye û ger di pêş de bizewice jî ew ê bixweze bi yekî ko nêrîna wî nêzîkî nêrîna wê ye re bizewice. Doktor Sertaç bi bergerîn digot ko erê ew niha wilo difikire, lê ew ê di pêş de nêrîna xwe biguhere û ew ê jî ji bo bi destxistina mafê gelê xwe têkoşînê bide.

Doktor Sertaç digot, ger ew bi hev re bizewicin wê bikaribin bi hev re xebateke zanistî bajon. Mamosta Perwîn jî jê re behsa wî mamosteyê fizîkê kiribû û gotibû, ew wê dixwaze, lê ji ber ko ew ji zewacê re ne hazir e, niha nikare bi kesî re bizewice. Ew ê dilxerabî bi Doktor Sertaç re çêbûbe, loma behsa wî mamosteyî kiribû û gotibû, wê rojê bi serxweşî ketibû hundirê pastexanê, ji hemû muşteriyan re xeber dabû, bi vê yeka han xortekî Siwêregî yê porxelekî ji cihê xwe pengizî bû û heta ko dev û pozê wî di xwînê de der kiribû, lê xistibû. Bi gotina Doktor Sertaç ko ne ji wî bûya, du xortên din jî xwe lê rakişandibûn, lê Dokto Sertaç û du hevalên xwe yên doktor nehiştibûn û heta yek ji wan bi wî mamosteyê fizîkê re çûbû malê jî. Mamosta Perwîn bi xwe bi wê pevçûnê hesiyabû, lê mamostê fizîkê bi awayekî din behs kiribû. Wî gotibû gava ew êvarî ji restorantê derdikeve, li kuçeya tarî du pêxwas riya wî dibirin, kêrê lê dikişînin û ji wî peran dixwazin. Gava momasta peran nade wan ew herdu pêxwas bi kulman lê dixin, lê tam di wê navê de sê mirovên navsal di wir re derbas dibin û bi zorê wî ji nav lepên wan derdixin û heta yek ji wan zilaman jî birîndar dibe.

Mamosta Perwîn ew mamosteyê fizîkê parastibû û gotibû ew qet bi wî şiklî venaxwe û ger vexwe jî ew tu carî serxweş nakeve û ger serxweş bikeve jî bi tenê dikene, hebekî zêde dipeyive û henekan dike. Bi van gotinên mamosta Perwînê, dilxerabî bi Doktor Sertaç re çêbû, piştî kêlîkekê

dev avêt lixwekirin û meşa wî. Paşê ji mamosta Perwîn pirsî ka bê wê û wî
mamosteyî tu caran bi hev re vexwarine an na. Mamosta Perwîn jî got ko bi tenê carekê di xelasoka dibistanê de hemû mamostan bi hev re şeveke 34

şahiyê çêkiribûn û wê jî hingî qedehek şereba sor vexwaribû.
Doktor Sertaç di wê navê de şûşeyeke wîskî ko ji çaran yekê wê vala bûbû ji bara xwe derxist û du qedehên kirîstal ên wîskî jî derxistin, qedehek dagirt, kirî ya din jî dagirta, lê mamosta Perwîn destê xwe da ber û got ko ew ji wîskiyê hez nake. Doktor Sertaç got, ger ew ji wîskiyê hez nake, şeraba sor û a spî jî heye, ger ew bixwaze ew dikare jê re qedehek şerab bîne. Mamoste Perwîn ji wê yekê re jî got, na û tenê qîma xwe bi hinek ava pirtûqalan anî û got, berî şev dereng bibe, divê ew here malê; ji
ber ko wê hevaleke wê ya mamoste îşev were mêvandariya wê. Doktor Sertaç wê li ser hev vexwaribe loma hebekî serê wî xweş bûbû û du-sê caran jî li ser hev çû tualetê. Cara dawî ko ji tualetê vegeriya, li nêzîkî mamost Perwîn rûnişt. Mamosta Perwîn jî xwe kar kir ko here, lê Doktor Sertaç li ber geriya û xwest ew kêliyek din jî rûne. Di wê navê de jî Doktor Sertaç destê xwe dirêjî Mamoste Perwînê kir, destê xwe danî ser stûyê wê
û jê re got, ko wî tu caran ji tu însanan ewqasî hez nekiriye. Mamosta Perwîn wek her car got, ko heya niha ew tu carî li zewacê nefikiriye û ger zewaceke wê hebe jî ew ê ancax di bîst û heft-heşt saliya xwe de bifikire. Doktor Sertaç jî gotibû, xem nake, em dikarin ji hev re soz bidin, dergistî bibin û heta êdî te dît wext e, wê çaxê em dikarin bizewicin. Gava wî ew gotinên han jî gotibûn, qirpika wî hilatibû, bêhna sîrê ya ko ji xwarina

duh de mabû li ser çavên Perwînê ketibû. Ji bo Doktor Sertaç li ber xwe nekeve, Mamosta Perwîn berê xwe neguhertibû, lê piştî kurtedemekê, gava çavên wê li şûşeya wîskiyê ketibû, dîtibû ko şûşe li ber xelasbûnê ye. Wê Doktor Sertaç jî ew yeka han ferq kiribe, loma gotibû, ew ji wîskiyê pêve tu vexwarinên din venaxwe û gotibû vexwarina şerab û bîrayê bi tenê himaltî ye. Mamosta Perwîn jî gotibû, kultura wê ya vexwarinê hebekî kêm e û hema bi lez li saeta xwe nihêrî bû. Gava dîtibû ko saet nehê şevê derbas dike, destûra xwe xwestibû û her çiqas Doktor Sertaç li ber
wê geriyabû jî dîsa ew rabûbû ser xwe. Li ber derî jî Doktor Sertaç bi bergerîna zarokekî li ber wê geriyabû û dîsa bê çawa ew ji wê hez dike, jê re li ser lingan behs kiribû. Carekê jî pişta xwe dabû derî, bi herdu destên xwe bi derî girtibû û xwestibû ji çûyîna mamosta Perwînê re bibe asteng. Di wê deqîqê de tirsek ecêb li mamosta Perwînê peyda bûbû, hema ji nişkê ve kiribû qîrîn, dehfek dabû Doktor Sertaç, derî vekiribû, di derencan de ji qatê pêncan bi bazdan daketibû jêr, di derketina avahiyê de li dergevan rast hatibû, lê li dergevan jî nesekinibû, derketibû der û bi gavên xurt lezandibû. Dergevan li wê rewşa wê ya bi kelecan ecêbmayî
35
KEVOKA SPÎ

mabû, lêva xwe berevajî kiribû, milên xwe hejandibûn û hêdî daketibû qatê avahiyê yê herî bin.
Doktor Sertaç jî li hundir, li ber derî, li ser zik dirêjkirî mabû, serê xwe xistibû nava herdu destên xwe û bi girîna zarokekî dikir îskîn. Car caran jî bi dengê hebekî bilind xwe bi xwe digot, »Kes ji min hez nake, ez ne spehî me, Perwîîîn… ez ji te hez dikim!…«
36

Heyştê adarê
Di heştê Adara 1982an de, li komelê, di civîna di derheqê jinan de Mamosta Çetîn destûra peyvê xwestibû û bi germî dipeyivî:
— Gelî hevalan, ez ê li vir zêde behsa problemên jinên dinyayê nekim. Qesta min ne ew e ko problemên jinên dinyayê tune. Belê, hene... Bi hezeran e... Problemên jinên ewrûpiyan jî hene. Ew jî bindest in, ew jî tên mêtin. Lê ji ber ko di vir de armanca min jinên kurdan e ez ê nexwazim dûr û dirêj behsa jinên dinyayê û problemên wan bikim. Erê hevalno! Wek hûn dizanin, jinên kurdan bindest in. Ew hem cinsî, hem neteweyî, hem jî sinifî bindest in. Civata me civateke paşdemayî ye, civateke xwedî gelek bermayên feodalî ye. Di vê civata paşdemayî de, di vê civata nexweş
û bi sinif û bi berberî de jinên me yên xweşik û spehî di bin êş û zilmeke dijwar de dinalin. Ew weke heywanan tên kirîn û firotin. Ji wan re evîn tune ye, xweşî tune ye, jiyan tune ye. Ew kole ne, hevalno! Ew bindest in! Divê em xwendevan û ronakbîrên kurd li jinên xwe xwedî derkevin. Em keçên xwe bidin xwendin, em wan bigihînin, jinên zana ji wan derxînin. Em keçên xwe bi dilê wan bidin. Em jinên xwe bi xwe re bibin komeleyan, civînan, civatan, dîlanan. Em wan bibin şev û şahiyan. Bila jinên me bixwînin, nûjen bibin. Gelî hevalan, bi kurtî, divê jinên me serbest û azad bibin!
Mamosta Çetîn bi van gotinan dawiya peyva xwe anî, ji bo destûra peyvê spasên xwe ji serokê civînê re got, ew gulpa qehwê ya sar, ko berî bi
nîvsaetê di binê fîncana wî de mabû, bi hêdîka, bêî ko firrîniyê jê bîne, vexwar û çavên xwe bera sernaveke rojnama ko li ser masê bû da û bêdeng

ma.
Nêzîkî sih kesan beşdarî civînê bûbûn. Ji wan sih kesan bi tenê yek jin bû. Xuyabû peyva mamosta Çetîn baş tesîr li jinikê kiribû. Wê bi hêdîka, bêî ko haya kesî bigihînê, bi destmalka xwe ya kaxizî hêsirên xwe pakij dikir.
Piştî mamosta Çetîn, yekî din jî destûra peyvê xwest, bi kurtî behsa dîroka heyştê adarê, tevgerên jinan, behsa rola jinan di têkoşîna sinifa
37
KEVOKA SPÎ

karker de, behsa feminîzmê û behsa ko çawa jinên kurd perçeyek ji tevgera jinên cîhanê ne, kir.
Civîna wan kurt, lê germ, bi munaqeşeyan ve tijî û bi serfirazî dawî hat. Mirov ev yeka han, piştî civînê ji rewşa beşdarên civînê jî ferq dikir. Mamosta Çetîn piştî civînê jî bi du hevalên xwe re çû bîraxaneyekê û her yekî ji wan bîrayek du bîra jî vexwarin. Ew derengê şevê, saet li dor yanzdeh û nîvan çû malê. Digel ko mifta wî hebû jî, dîsa wî weke hertim li zengilê derî xist û li benda vekirina derî rawestiya. Di lêdana cara pêşî de gava derî venebû, mamosta Çetîn carek du carên din jî li derî da. Bi lê-dana sisê an çaran re, jina wî çavlixew û bi kirasê şevê li wî derî vekir.
Bi vekirina derî re mamosta Çetîn bi dengekî bilind bi ser de qîriya:
— Ma qey heta ez bîst carî li derî nedim tu derî venakî?
— Deng nedihat min, jinikê bi çavlixewî got.
— Deng nayê te ne wilo? wî bi hêrs pirsî. Ger dengê Gulê bûya wê bi-hata te!
Gulê hevaleke jina wî bû. Ji ber ko ji eynî bajarî bûn û li welêt jî cîranên hevdu bûn, wan car caran hevdu didîtin.
Mamosta bi van hevdudîtinên wan aciz dibû. Sedema acizbûna xwe jî

bi nebaşbûna Gulê ve girê dida.
— Çi ye, te xêr e dîsa? jinikê got.
Mamosta Çetîn çakêtê ko ji xwe kiribû dirêjî wê kir û bi hêrs,
— Hişş, dîsa devê te vebû, got, derbasî metbaxê bû û li herdu beroşên li ser ocaxê nihêrî. Gava ew xwarina ji firavînê de mabû, dît, bi dengekî bilind got:
— Êdî te dev ji çêkirina xwarinê jî berdaye, tu bûyî xanim!
— Ne te got, ez îşev nayêm şîvê, ez ê dereng werim malê. Xwarina me jî hebû, min got heyf e ko ez vê xwarinê hemûyî birijînim û xwarineke nû çêbikim.
Mamosta Çetîn li ser lingan, hema wilo bi sarî çend kevçî jê xwarin û li ser kursiyeke ber masa metbaxê rûnişt.
Jina wî jî, digel ko ew ji xewa gêj bûbû, li ba wî rûnişt.
— Rabe ji min re çayekê çêbike, mamosta bêî ko lê binihêre got.
Jinik rabû ser xwe, çaydan nêvî av kir, danî ser ocaxê û dîsa hat li ba wî rûnişt.
— Pir kes hatibûn civînê? jinikê jê pirsî.
— Erê, pir bûn, mamosta bêî dilê xwe bersiv da.
— Jin jî hebûn?
38

— Erê, tenê tu kêm bû (!)
— Ev te xêr e îşev?
— Min xêr e? Êdî tu ne xwarinekê çêdikî, ne kincekî dişoyî, ne malê paqij dikî! Tu ancax bi Gulê re rûnî û paşgotiniyan bikî. Binihêre! Careke din jî tu bêî xebera min neçî cihekî!…
Jinikê tu mane ji wan gotinên wî re nedît. Rabû ser xwe, jê re çaya wî dem kir, danî ber wî û xwest ko here ji xwe re razê.

39

KEVOKA SPÎ

40

Stêrkek ji ezmanê me xuricî

Piştî programeke televizyonê, ez bi cangiranî bi mêrdewanê ve bi jor ketim û çûm ser xênî. Yek ji tiştên ko min deh salan li Ewrûpayê hesreta wê kişandibû jî, razana li ser bana bû. Min gelekî ji razana li ser bên hez dikir û her êvar heta bi nîvê şevê min xwe li ser nivînê xwe dirêj dikir, destên xwe dixistin bin serê xwe û min li stêrkên ezmanê welêt dinihêrî. Wê şevê jî min wilo kir. Bêî ko ez kincên xwe ji xwe bikim, min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir, destên xwe xistin bin serê xwe û di bin bayê payizê yê sivik û hênik de li stêrkên ezmên nihêrî. Gelo berê jî ezmanê welêt bi ewçend stêrik bû? Çiqas stêrkin xweşik, çiqas diçirisîn. Ez di wê navê de li Leyla û Mêcnûn fikirîm, min ew jî dîtin. Min çavên xwe li riya Kadizê gerand, min ew jî dît. Min demeke dirêj bala xwe berda Leyla û Mêcnûn û ez li benda ramûsandina wan rawestiyam. Min ramûsandina wan bidîta, min ê ji xwe re tiştin bixwesta, tiştin hêvî bikira. Qet nebe me bi zaroktî wilo bawer dikir. Em heta bi derengê şevê li benda ramûsandina wan diman û

em wilo di xew re diçûn. Tiştê ecêb, gava ez li wan rojên xwe yên zaroktiyê difikirîm, min xwe mîna zarokan hîs dikir. Şewqa stêrkên ezmên ez dibirim salên min yên zaroktiyê. Di salên xwe yên zaroktiyê de ez heyrana şewqa elektirîkên bajarê Mêrdînê bûm. Nizanim gelo we tu carî bi şev di nêzîkî Mêrdînê re rêwîtî kiriye? Şewqa elektirîkên bajêr wilo germ, wilo dostane ye, bajar ewçend bilind e ko mirov dibêje qey ew bi stêrkên li ezmên re qayişê dikişîne. Ez di xeyalan de kûr çûbûm. Ez li ez-

manê ewqas bilind û bêstûn ecêbmayî mabûm. Di wê navê de ne ji dengê diya min bûya, belkî ez bi saetan ji xeyalên xwe venegeriyama jiyana rastî.
— Ma tu firrek çeqilmast venexwî lawê min?
Ez bi dengê diya xwe veciniqîbûm, min ew tasa çeqilmêst a ko hîn qeşa wê neheliyabû ji destê wê girtibû, çend gulp jê vexwaribûn, min paşê ew tas danîbû ser pirêketekî li ber serê xwe, min dîsa xwe li ser piştê dirêj kiribû û li ezmanê bê ser û bin û li stêrkên bi şewq û rohnî nihêribû. Û ez
41
KEVOKA SPÎ

wilo di xew re çûbûm. Lê ez nizanim çiqas tê de çûbû, ez bi dengê teqîneke ko bêdengî û kerrîtiya şevê çirand ve şiyar bûm. Bi şiyarbûnê re min dît ko ew stêrka li nêzîkî Leyla û Mêcnûn rijiya erdê.
***
Sibehê zû li mala cîranê me dengên lîlandin û çepikan dihat. Min ji diya xwe pirsî, wê got: »Stêrkek ji ezmanê me xuricî, keçika cîrana me ya berzewacê şehîd ket«.
Her ko roj bilindtir dibû, dengên lîlandin û çepikan zêdetir dibûn.
42

Xewna Orhanow
Piştî mayîna deh salan ya li Swêdê, Orhan biryara xwe da ko seriyekî here welêt.
— Ez çûyina xwe ji tu kesî re nabêjim, wî xwe bi xwe got. Ne ji hevalên vir re, ne jî ji malê re. Ger ez ji Serdar re bibêjim, ew ê ji her kesî re bibê-je, ew bi devê xwe nikare. Ez nabêjim. Ez zanim ew ê dilê xwe bigire, lê tişt nabe, ez ê dîsa dilê wî xweş bikim.
Piştî bi du rojan wî firaxên xwe xistin hev, baholek tijî kinc û diyarî kir;

lê ji nişkê ve ramanek hatiyê.
— Na, got, ez tu tiştî bi xwe re nabim. Ez ê destvala herim. Tew nebe ez ê li Tirkiyeyê diyariyan bikirim. Oooxx... Wê çiqas xweş bibe. Azadê birayê min çav li min bikeve, ew ê ji dûr ve baz de pêşiya min û mizgîniyê bide diya min. Lê niha bênamûso mezin bûye. Erê, erê, ew mezin bûye... Ma ne bavê min carekê di nameyeke xwe de nivîsandibû û gotibû: »Azad êdî mezin bûye, porê xwe şeh dike û ji keçikan re difîkîne«. Haa!...Ya baş ew e ez bi şev herim, bê ko kes min bibînin. Ez ê hêdî herim ber derî û li der bixim. »Kî ye?« Wê diya min bi dengê xwe yê zirav bipirse. Lê ez ê dengê xwe biguherim; ez ê bi dengekî qalind bibêjim: »Derî vekin!«. »Tu kî yî?« wê diya min bipirse. Ez ê îcar dengê xwe zirav bikim, »Derî vekin, zû!«. Wê birayê min Xelîl ji nav nivînê xwe bipeke û pirtûkên xwe di nava kîsên genim de veşêre û wê diya min bibêje: »Lawê min ne li mal e, em
cihê wî nizanin!« Hingî ez ê bibêjim: »Dayê, ez im, derî vekin!« Wê birayê min yê navê bi dengekî nizim bibêje: »Derî venekin, esker in, derewan dikin.« Derî vekin« ez ê bibêjim dîsa. Bavê min wê bibêje: »Weleh ev dengê Orhan e.« Wê giş bi hev re baz bidin û derî vekin. Hingî ditirsim dilê diya min bisekine. Na, na, ez wilo naçim. Ya baş ew e ko ez bi roj herim malê. Dibêjin muxbir pir bûne, ma kî ê min nas bike? Ev deh salên min in ko ez ji welêt derketime. Hingî ne riha min, ne jî simbêlê min hebûn. Niha ez hatime guhertin; rih û simbêlê min şîn hatine û cênîkên min spî bûne.
Hîn wilo, çend caran li deriyê wî ket. Wî zû bi zû bahola xwe xist
43
KEVOKA SPÎ

dolabê, bilêta xwe ya balafirê ji ser masê hilanî, xist bêrîka xwe; baz da û

derî vekir.
Serdar ket hundir.
— Oo, Serdar bi devkenî got. Ev çi kinc in te li xwe kirine? Tu ê herî konferansan an herî ba keçik meçikan?
…
Ew bi hev re derbasî hundir bûn û heryekî cigareyek vêxistin.
— Weleh êdî ez aciz bûme, Serdar bi derd got. Ev deh salên me ne ko em li vî welatî ne, ka me çi ji xwe fêhm kir?
— Va ye ez diçim, Orhan got. Ez ê herim mala we jî.
— Tu ê herî ku?
— Ez ê herim welêt.
— Eh, çawa ko ez diçim, tu ê jî wilo biçî.
— Weleh ez ê herim.
— Loo, de tu dev ji van haweyan berde. Ma tu ê min bixapînî.
— Ê baş e, tu bawer neke.
— Ji te weye ez bawer dikim?
— Tu zanî, dixwazî bawer bike, dixwazî bawer neke.
— De tu dev ji van haweyan berde, Serdar dîsa got.
Orhan bilêta xwe ya balafirê derxist û nîşanî wî da:
— Tu îcar bawer dikî?
Serdar bilêt ji dest girt û lê nihêrî:
— Tu dikî bi rastî jî herî?
— Erê, piştî nîvsaeta din divê ez herim. An na ez ê ji balafirê bimînim.
— Ma haya malê ji çûyina te heye?
— Na, min ji kesî re negotiye. Min ji te re jî nedigot, lê tişt nabe, em hevalên hev in.
Bîskê li ser dûriyê, li ser keçikan û li ser siyasetê peyivîn. Dû re Serdar hin tembîh lê kirin û bi hev re çûn balafirgehê.

Berî ko Orhan li balafirê siwar bibe, Serdar got:
— Wî tiştê ko min ji te re got, tu ji bîra nekî ha!
Herdu hevalan destên xwe ji hev re hejandin û Orhan bi hewa ket û çû.
***
Çaxa ew li balafirgeha Stembolê peya bû, kal û pîrek û sê xort hatin pêşiya wî. Pîrê xwe avêtiyê û bi girî got:
44

— Ooxx... şukur, tu hatî lawê min. Maşale, maşale, lawê min bûye mî-na şêrekî.
Dû re peyayê kal û hersê xortan xwe avêtinê.
— Ooh Gud, vi trodde aldrig att vi skulle träffa dig igen,1 peyayê kal got.
Ew dê û bavê wî û hersê birayên wî bûn.
— We ji ko zanî bû ez ê îro werim? Orhan bi ecêbmayî pirsî.
— Vi visste, bavê wî got. Vi vet allt. Det är Gud som meddelar oss? 2
— Tu ji ko hînî swêdî bû yî? Orhan bi şaşmayî jê pirsî.
— Hemma pratar vi svenska,3 diya wî got.
Bavê wî yekî bejinkurt bû. Porê xwe yê spî li ser piştê şeh kiribû. Berçavkeke doxdarînî û hebekî reş li ber çavan bû û her dikeniya. Diya wî bi du tiliyan bi ser bavê wî diket. Berî ko Orhan ji welêt derkeve, diya wî sernixumandî bû. Lê niha tu tişt li serî tune bû; serqot bû. Kirasekî kurt û vezelekî milkurt lê bû, zeyif bûbû û herdu gepên wê kort çûbûn. Ne dê û ne jî bavê wî ko ne ji lixwekirina wan bûna, ew zêde nehatibûn guhertin. Lê birayên wî? Orhan bi tenê yê mezin nas kir. Ger birayê wî yê mezin resimê xwe jê re neşandibûya, wî ê ew jî nas nekira.
Hersê bira jî bi ser wî diketin. Yê biçûk ji herduyên din dirêjtir bûbû. Bejna wî zirav bû û qatek kincên reş lê bû. Herduyên din jî her yekî qatek

kincên spî lê bûn û solên rengo mengo di lingên wan de bûn.
— Êê, we ji ko zanîbû ez ê îro werim? Orhan bi dengekî nîvgirî û bi hêvî pirsî.
— Me zanî bû, me zanî bû, bavê wî got. Erê tu ji Xwedê bawer nakî, lê wî ji me re got.
Dîsa wan yek bi yek Orhan hembêz kirin.
— De em herin, bavê wî got, ancax em bigihîjin ser otobusê.
Hemû bi hev re ber bi termînala otobusê ve meşiyan; li otobusê siwar bûn û berên xwe dane Diyarbekirê.
Di rê de diya wî ji aliyekî, bavê wî ji aliyekî û birayên wî ji aliyekî ve di pencereyên otobusê de bi destan der û dor nîşan didan û digotin: .
— Binihêre, me ji te re dinivîsand û digot, welatê me xweş bûye, bûye cenet, te bawer nedikir. Esker mesker nemane, polîs nemane, tu kes hev-du nakujin, herkes ji hev hez dikin. Ma ne te jî wisa dixwest? Binihêre, binihêre bê çiqas xweş bûye.
— Erê Wele, Orhan got. Welatê me ji Swêdê jî xweştir bûye.
45
KEVOKA SPÎ

— Lo lo! Tew tu bajarê me bibînî!
Saet nehê êvarê otobusa wan li bajarekî sekinî. Bajar wêran bû û xaniyên bajêr yên bilind ji şûna gulleyan bûbûn weke seradê.
— Ev e bajarê me yê weke cenetê? Orhan bêhêvî pirsî.
Bavê wî,
— Na lawê min, got. Ev Bêrûdê ye, Lubnanê... Xelk li vir hevdu dixwin, herkes bi hev ketine, herkes hevdu dikujin. Ev jehrtêketiya Bêrûdê ye!
Orhan şaş û ecêbmayî mabû:

— Ger ev Bêrûdê be çima otobusa me di vir re diçe?
— Ew çîrokeke dûr û dirêj e, lawê min. Bi xêr ko em bigihîjin malê ez ê ji te re bibêjim.
Otobusa wan gihîşt Diyarbekirê. Çaxa ew ji otubusê peya bûn û ber bi malê ve meşiyan, bavê wî got:
— Me ji te re negot ko bajarê me bûye cenet. Binihêre, ma ne weke cenetê ye?
Bi rastî jî bajar mîna buhuştê bû. Bedena wê ji nû ve hatibû lêkirin, hemû xanî spî bûn û her der hêşnayî bû. Mirov, dikan, otomobîl, hema her tişt hatibûn guhertin.
Birayê wî yê biçûk got:
— Te ji me bawer nedikir. Ka polîs? Ka esker? Ew çûn, dema wan çû. Dewleta wan jî çû… Em niha xwe bi xwe ne, em bi xwe dewlet in.
Ji bo Orhan sê rojan li def û zurnê ket, berx û beran hatin serjêkirin û şekir li zarokan hatin belavkirin. Roja çaran çar peyayên bejindirêj û bi navmil hatin mala bavê Orhan û bixêrhatinî dane Orhan. Piştî ko rûniştin, yekî ji wan got:
— Em endamên hukûmeta Kurdistanê ne û me bihîstiye ko te li Swêdê ekonomî xwendiye, ji ber vê yekê em dixwazin tu jî di hukûmeta me de cih bigirî.
Hîn berî ko Orhan bersivê bide, lawikek bi bayê bezê ket hundir û bi heyecan got:
— Apê Orhan, baz de, xwe veşêre, esker hatin.
Hîn peyva lêwik di dêv de bû, li telefonê ket. Lê kesî bersiv neda. Telefonê her dikir zire zir. Orhan rabû ser xwe ko baz bide, ew her çar peya jî rabûn û nasnavên xwe nîşanî wî dan,
— Em polis in, gotin, tu çûyî Swêdê û tu li dijî dewleta me xebitî yî. Bide pêşiya me!

46

***

Hingî Orhan ji xew hol bû, di karyole wer bûbû, li ser wê erda sar dîsa laşê wî di xwêdanê de mabû. Saeta wî jî her dikire zire zir. Saet li ser heftê sibehê lêdixist. Wî bi hêrs destê xwe li saetê xist û axînek kûr kişand. Rabû ser xwe û çû daşirê. Piştî bîskekê posta wî hat. Du name, dîploma wî ya ekonomî, kovarek û du rojname jê re hatin. Yek ji wan nameyan jê re ji malê hatibû. Wî bi lez ew name vekir û xwend. Gava di nameyê de bihîst ko birayê wî hatiye berdan, kêfa wî hat, bi lez kincên xwe li xwe kirin û çû mala Serdar. Serdar hê di xew de bû, bi tena derpîkê kinik jê re derî vekir.

— Çi ye, te xêr e vê sibehê? Serdar jê pirsî.

— Tu dizanî Serdar...

— Ez çi dizanim? Te dîsa xewnin ditîne?

Orhan keniya:

— Erê.

Serdar jî bi ken got:

— Wele tu li me bûyî Oblomov. Dawiya xewnên te nayên bavo. Xêra xwedê yek derketa, xewnên te binivîsandina û navê pirtûka xwe jî bikira »Xewnên Orhanov«. Êê, de ka bêje, tu dîsa dibûyî serokwezîrê Kurdistanê, an wezîrê kulturê?

Orhan keniya. Ew bi hev re derbasî mitfaxê bûn û ji xwe re taştê çêkirin. Heya derengê rojê ew li ser xewna Orhan, li ser rewşa xwe ya li Ewrûpayê û li ser rewşa welêt peyivîn.

(1) Oo Xwedêyo. Me qet bawer nedikir ko em ê careke din te bibînin.

(2) Me zanîbû. Em bi her tiştî dizanin. Xwedê haya me digihînê.

(3) Li malê em bi Swêdî dipeyivin.

47

KEVOKA SPÎ

48

Kêzika bênav

Piştî rêwîtiyeke dirêj ez ji Şamê gihîştim Qamîşlokê. Ji bêxewiyê û ji guhertina hewa û xwarinê ez gêj bûbûm. Wê êvarê, her çiqas hin mal-batên kurdan nexwestin ez herim hotêlê û bi çûyina min ya hotêlê dilê xwe girtin jî, dîsa min bi ya xwe kir; ji bo rehetiya xwe û bi fikira ko ez ê her roj bikaribim serê xwe bişom, ez çûm hotêlê.

Qaşo hotel luks bû. Ji xwe gava mirov ji derve li avahiya hotêlê dinihêrî, hotel gelekî xweş û luks xuya dikir. Li gora hotêleke Rojhilata Navîn û bajareki piçûk, ger em paqijiyê deynin aliyekî, hêwana wê jî ne xerab bû. Nizanim çima, lê dibe ji ber ko ez biyanî bûm û xwediyê paseporteke Swêdî bûm, ne şagirtên hotêlê, lê xwediyê wê bi xwe bi min re mijûl dibû. Gava mêrik odeya min û nivînê ko ez ê tê de razêm nîşanî min da, ga-lonekî mazotê jî anî û ji min re sobe dada.

— Swêd sar e, lê şevên biharan welatê me jî sar e, bi ken got, şevbaşî da min û derket.

Ez demekê wilo bêdeng li ser nivînê xwe rûniştim û min çavên xwe li hundirê odê gerand. Ji serşuştin û razanê pêve tu tişt nedihate bîra min. Ji ber ko min dizanîbû wê saetê ava germ peyda nabe, di destên min de bi

tenê razan mabû. Her çiqas pakbûna nivîna ne bi dilê min bû jî, min kincên xwe ji xwe kirin, lampa xwe vemirand û hêdî ketim nava nivînê xwe. Hema ko ez xilmaş bûm dengê xişxişekê hat min. Bi bihîstina deng re min bi hêz serê xwe ji ser bahlifê rakir, guhên xwe miç kirin û li wî

dengî guhdarî kir. Îcar ne bi tenê dengê xişxişê, her wisa dengê çîzeçîzekê jî hat min. Ez bi xwe ji kurmik û kêzikan ditirsim, an jî ez ji wan zehf aciz im, loma ez ji nav nivîna pekiyam û min zû lampe pêxist. Çer ko min lampe pêxist, min dît ko tiştek bilez ket qelîşteka dîwêr. Demeke dirêj sola min di destê min de bû û ez li benda wî tiştî rawestiyam. Di wê navberê de jî ji bo ko ez bê tirs bikaribim razêm, min di serê xwe de plana ko ez ê çawa û bi çi awayî bikaribim wî benderuhî bikujim, çêdikir. Ez demeke dirêj li benda mam, lê ew derneket. Ez weha westiyabûm, ko êdî nikarîbûm li ser lingan rawestiyama. Min sola di destê xwe de danî û bêî

49

KEVOKA SPÎ

ko lampê vemirînim, min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir.
Bi xişexiş û çîzeçizeke din, min dît ko kêzikek mezin ji qelîşteka dîwêr derket û bi dîwêr ve rapelikî. Erê, bawer bikin min kêzikeke wilo qet nedîtibû. Herdu çavên wê sor wek du bizotên êgir bûn. Pozê wê reş û deqeke spî lê bû. Serê wê mîna serê mûrîyekê biçûk bû; lingên wê baş nedihatin xuyakirin, lê ji çaran zêdetir bûn. Gava diçû ber zikê odê rengê wê kesk dibû, ko xwe berdida jêr rengê wê dihat guhertin, sorereş dibû. Min jî xwe li ser nivînê xwe dirêj kiribû, herdu destên xwe xistibûn bin serê xwe û li wê kêzikê temaşe dikir. Te digot qey ew bi min re ketibû qay-
işê, ez hêrs dikirim. Carinan bi lez bi dîwêr ve radipelikî, diçû ber zikê odê, demekê li wir radiwestiya, bi çavên xwe yên sor li min mêze dikir, serê xwe çend caran dihejand û dû re bi lez xwe berdida jêr. Na, diviyabû ew kêzik wê şevê bihata kuştin, an na xew li min tunebû. Ez dîsa weke berê bi lez ji nav nivîna pekiyam, min rahişt sola xwe ko biavêjimê, lê kêzikê çivek da xwe û dîsa ket qelîşteka dîwêr. Ta ko ez li ser lingan bûm

ew derneket, lê gava min xwe li ser nivîna dirêj kir, ew dîsa derket û dîsa weke berê bi jêr û jorê dîwêr ve çû û hat. »Ya Rebî ez ê çi bikim?« min di dilê xwe de got. Tu nabêjî westandinê zora min biribû û hema ez bi wî awayî di xew re çûbûm.
Min xewneke ecêb di xew de didît. Di şerekî nenas de, hevalên min hemû şehîd ketibûn. Ez jî birîndar bûbûm û di nava xwînê de vedigevizîm. Bi wê birîna xwe ya xedar, bi rik û hêrseke ecêb min xwe ji ber dijmin dida alî û ez bi çiyê ve radipelikîm. Ji bo ko ez xwe nedim dest û şopê ji ser xwe winda bikim, min xwe davêt şikeftekê. Şikeft teng û tarî bû. Di wê şikefta teng û tarî de, ji nişkê ve marekî stûr û bi quloç êrîş tanî min. Demeke dirêj min û mêr li ber hev dida. Geh wî li min dixist ez bi çend gavan bi paş de dipengizandim, geh min lê dixist ew bi çend gavan bi şûn de dişand.
Dawî dawî min bi hêz destek lê xist û ez bi êşeke giran ji xew şiyar bûm. Gava ez rabûm, ez di xwêdanê de mabûm. Her du çongên min dihejiyan û xureke ecêb laşê min girtibû. Min kir û nekir çavê min yê çepê venebû. Gava min destê xwe danî ser, min hîs kir ko weke hêkekê werimî ye û tiştek pê ve zeliqî ye. Min ew tişt bi neynûkan da alî û bi çavê rastê baş lê nihêrî; min dît ko kêzika min e.
Ez hingî têgihîştim ko min di xew de destê xwe li ser çavê xwe xistiye û kêzik kuştiye.
Ji wê rojê pê ve ez neçûm hotêlê û heya bi hefteyekê bi zor werimandi-
50

na çavê min daket.
Lê navê kêzikê ji min re bû meraq. Min ji kîjan xelkê Qamîşlokê, gundiyên der û dora Qamîşlokê, kurdên Şam û Helebê pirsî û kêzik ji wan re tarîf kir jî, her gotin:

— Xeyo, welle em nizanin.

51

KEVOKA SPÎ

Ereb Şemo

A

SIVAN~

L~~~~G~~

kurdî-fransizî

kurde-français

INSTITUT KURDE DE PARIS

1989

Ereb Şemo

MIRINA KALEKÎ RIND

ROMAN

Orfeus

© Mehmed Uzun

Tryckt av Grafîca i Malmö AB, 1987
Orfeus Bokförlag
Vanadisv. 18, 2tr,
113 46 Stockholm - Sweden
ISBN 91-87074-Ö2 8

Ji kalên rind Osman Sebrî, Cfgerxwîn, Hesen Hişyar, Hêmin, Feqî Husên, Şêx îzeddîn Huseynî û Efîf Huseynî re spas ku wan rê li kalê Rindî vekir...

Ji bo bîranîna Seyda Cîgerxwîn

Bûbûya Yûsifê Misrê li ken'anê beser peyda
Nesîmê sinbil û sêvan seher da hebs û zîndanê
Vebû qifla me bê mifte wê ringînî di qelbê da
Meleyê Cizîrt

Min ew di berbanga wê şeva bi tirs û xof de nas kir. Wê şevê me tixûb li pey xwe dihîşt... Me berê xwe dida oxirê, pişta xwe dida felekê.
Çiqas rast e, ew qisa ku dibêje «jiyan tabloyeke rengm e ku bi rengên xweşik yên tesadufan ve hatiye neqişandin» çiqas rast e... Eger ez negihîştima berbanga wê şevê, - ew şeva ecêb ku di jiyana min de rûpeleke nû vekir û ez hê jî baş tênegihîştime ka ew şev şeveke çawan bû - bê guman, dê di tabloyê de şopên firça wî tunebûna. Heye ku niha - kî dizane - di şûna wan rengên jîndar û xweş de dê rengekî wekî rengê xweliyê hebûya. Rengekî mirî û ji xweşî û jiyanê bi dûr... (Niha, min parantezek divê. Kalê rind, ez divê niha, rast bi rast, bi te re bipeyivim. Di vê kurtedema nivîsînê de ew rojên ku me bi hev re bihurandin, ew tiştên ku me ji hev re gotin, tu bi xwe û bîranînên te weke dilopên baranê li dor masa min direqisin. Tu, rûyê te, xet û xêzên rûyê te, kena te ya xweşik ji min bi dûr dikevin. Lê xatire û bîranîn diyar dibin, derdikevin pêş. Belê, eynî weke dilopên baranê... Belê, ev baranek e ku li dora masa min dibare. Piraniya caran ez di xewnên xwe de bi te re me. Yan jî ez her te difîkirim... Eger her tişt weke ku me hesibandibûn bimeşiyana û min bikaribûya te gelek carên din jîbidîta û ew tiştên ku ez mat hîştim wisan li pey hev nehatina, gelo ez dê dîsan weha di bin dilopên xatire û bîranînan de bimama? Ez vê yekê nizanim.
Lê belê, niha - piştî xewna min ya dawîn - êdî ez baş dizanim ku ez divê te û ew rojên ku em bi hev re bûn, binivîsînim... Ez bêgav mam, weke din tu çare neman; ez divê xwe bispêrim peyv û cimlan û ji dilopên stûr yên xatire, bîranîn û xewnan re coyekê, kanalekê vedim, bibînim, peyda bikim.
Tu çare neman; êdî peyv divê li ser lampa min ya li ser masê venişin û li dora wê bifîrin da ku ew bikaribin xewnên min ya herî rast, ya rastirîn xewnên te ronî bikin.
Tu, di xewna min ya dawîn de, hêdî hêdî ji ber çavan winda

bûyî... Em di kanaleke hov û bi mij û dûman de bûn.
Me dixwest, me xwe diêşand ku em ji xwe re rê vekin û ji wê derê derkevin. Dar, şax, çiqil û pelên her du aliyên kanalê bi ser serên me re dihatin û rê li me digirtin. Ne şev bû, lê tîrêjên tavê ji nedixuyan. Lê wan dixwestin ku di nav dar, şax, çiqil û pelan re biseridin û xwe bigihînin me. Ez nikarim bibêjim ku ew bi ser diketin û çavên me bi tîrêjên tavê diçirûsîn. Doraliyên me ewçend tarî bun ku meriv jê xof digirt. Belê, ew cîh, cîhekî tarî, bi mij û dûman bû. Kanal geleki teng, geleki bi zîk-zak bû û aveke boş tê de pir pit dixuşiya. Ango di kanalê de çûyin dijwar bû. Ez bawer im, av ne pak û zelal bû. Li ser avê serên masî û rawirên ecêb dixuyan. Ew - bi qasî ku min didît - celeb bi celeb bûn. Masî û rawirên birçî h benda me bûn... lcar, di bin me de jî tiştekî fîreh weke teh-tekê hebû. Ew tişt li ser avê; û em jî li ser wî bûn. Baş nayê bîra min, lê ez bawer im, ew tiştê di bin me de kitêbeke pir mezin ya bi çerm cîldkirî bû. Belê, ew kitêbek bû. Me jî, di destên me de misasên dirêj, me dixwest ku em, hem, rawiran ji xwe bi dûr xînin û hem jî ji xwe re rê vekin... Ez nizanim ka ev ger û çûyina bi tirs çiqas dewam kir, lê di dawiya dawîn de - piştî gelek tehlûkan - me xwe gîhand devê kanalê. Di tenişta kanalê de giraveke biçûk hebû. Girav têrdar û têrber bû. Piştî giravê deryayeke bê ser û ber dihat. Derya li ber me leylan dida. Hingê, gava ku me girav jî li pey xwe hîşt, êdî rê li me vedibû, em ji kanala tarî û ji wan rawirên ecêb bi dûr diketin û êdî me dê rûyên xwe bidana ber bi ronahiyê... Lê di wê navberê de, gava em ji ber giravê derbas bûn, tiştekî ku min qet nedipa, qewimî; tu derketî ser giravê. Te ez bi tenê hîştim.
- Riyên me li vê derê êdî ji hev vediqetin, te got. Ez nikarim heta wê derê, ku derya û aso bi hev re dibin yek, werim. Mixabin, teqeta min ji vê yekê re tune.
Ez şaş mabûm. Me zehmetî û dijwarî li pey xwe hîştibûn û

min wisan bawer dikir ku em dê bi hev re, ber bi deryaya zelal biçûna. Ez pêşî hêrs bûm, paşê jî li ber te geriyam da ku em bi hev re bicûna. Lê ji bilî ku tu bibişirî,-te tu tişt negotin. Bersîva te keneke rehet, bêdeng û bêpeyv bû. Dawiyê min ji te pirsî, - weke ku min sedemeke baş dîtibe:
- Baş e, lê ev tiştê çerm, ev keleka ku di bin me de ye?.. Ev tişt, ev keleka hêja ku em ji wan rawirên şêt û dîn filitandin, ne ya tebû?..
Tu dîsan keniyayî û te got:
- Edî ez ne hewcedarê wê me, bila ew liba te bimîne, ji te rebe.
Bi vê gotina dawîn re tu ziviriyî û hêdî hêdî di nav daran de winda bûyî.
Belê, xewna min ya dawîn bi kurtebirî weha bû. Lê min xewnên weha pir dîtin. Carekê jî, di xewneke min ya din de, te ez bi xwe re biribûm daristaneke pir ecêb. Daristan ecêb mezin bû û bi rengên têvel dibiriqî. Li wê derê jî, te dîsan ez di nav daristanê de hîştim û tu bi xwe winda bûyî. Min ji vê jî tu tişt fahm nekir; çima te weha dikir?
Min li wê derê jî dîsan bi heyret tiştekê dît; pelên darên curbecur di esasê xwe de rûpelên kitêban bûn. Ew tiştê ku daristan di nav ronahiyeke rengîn de dihîşt, ev rûpel bûn. Belê, rûpelên daran bûn...
Dema xewna dawîn ya ku min li jor bahs kir jî li van xewnan zêde bû, êdî min biryara xwe da ku ez xwe bispêrim peyv û cimlan. Bi tenê peyv û cimle dikaribûn min ji ew cîhana derve ku dijminê xatire, xewn û bîranînan e, biparêze. Peyv, bi tenê peyv dikaribûn alîkariya min bikin da ku ez li hember pêlên dijwar yên ba û bahozên jibîrkirinê rawestim. Bi tenê peyv dikaribûn ji min re bibin çeper û kozik...
Lê ez divê niha vê yekê jî bibêjim; ez di esasê xwe de nizanim ka ez dê çi bikim û çawan deynên çêyiyên te bidim û li te vegerînim. Niha jî, gava ez van rêzan dinivîsînim, car bi

car ev cimla kurt ji devê min derdikeve; spas dikim, spas dikim, spas dikim... Ji bilî vê cimla kurt ez nikarim tu tiştî bibêjim û bikim. Belê, weke dlopên xunava nîsanê ewçend bi dilgermî, dUgîrî û xemgîrî, ez bi tenê dikarim bibêjim, «spas dikim, spas dikim»...)
Min welatê xwe terk dikir.
Ez li ser rêwîtiyekê bûm.
Rêwîtiyeke kurt!
Lê gehîneka dawîn ya vê rêwîtiyê baş
nedixuya. Belê... ez ji welatê xwe bi dûr diketim û diçûm
10
cîhaneke nû ku li pey mij û dûmanê bû. Min ew cîhana xwe ya berbiçav û xwerû û tiştên wê; bajar, kolan, mal, meriv, rindî, xirabî, dijminahî û dostiya wê berdidan û ber bi cîhên ku li pey asmanan weke xêzeke tarî dixuyan, diçûm. Ez dê biçûma cîh û mekanên nû û dîsan vegeriyama cîhana xwe ya kevn...
(Kalê rind, ez dizanim, eger tu niha li vê derê, li nik masa min bûyayî, tu dê bi van qisên min bikeniyayî. Lê wê gavê, dema min welatê xwe terk dikir, helbet min mana vê cimla kurt ya jorîn nedizanîbû. Ma min dê ji kû bizanibûya ku ev rêwîtî, ev du peyv çûyin û hatin dê bi macere, dilkeserî, xemgînî û bêrîkirinê tijî bûna! Ma min dê ji kû bizanibûya ku kêfxweşî jî dê di vê rêwîtiyê de hebûna, lê hindik, her hindik! Ma min dê ji kû bizanibûya ku veger her gav hîn dijwartir e!
Belê, min diviya welatê xwe terk bikira. Ez diviya bireviyama. Lê belê, ji ber ku min her rêwîtî wekî helbesteke spehî jî didît, di vê rêwîtiya min de dilgermiyek, heyecanek jî hebû. Ez diçûm qitaya ku min bi tenê di kitêbên edebî de li ser xwendibûn. Qitaya ku min ji mêj ve dixwest ez wê bibmim; Ewrûpa. Min ji çîrokan dizanîbû ku her ger, her rêçûn, her rêwîtî weke helbesteke xweş di mêjî û dil de pêl

dide û îmkanên nû tîne pê da ku meriv tiştên xweş û nû
keşf bike. Ma di çîrokan de jî weha nedihat gotin?«hemû
tiştên xweş, neqş, xemil û xweşiyên xwe di rêwîtiyan de dikemilînin»
Ez li ber xwe diketim ku min welatê xwe terk dikir. Lê ez
wisan bawer bûm û min wisan dihesiband ku dê heyecan û
meraqa rêwîtiyê alîkariya min bikira da ku ez serfirazî û
11
xweşiyên nû peyda bikim. Herweha, tevi ev serfîrazî û xweşiyên
nû ez dîsan vegerim welatê xwe. Min dê tavên nenas dilop bi
dîlop biquHtandina; min dê bidîta ka stêrkên nenas çawan dibiriqin;
min dê merivên nenas, ziman û peyvên wan yên nenas binasiyana û paşê,
piştî van tiştan, ez dê dîsan vegeriyama cîhana xwe...
Lê min tiştekê nediesiband û ji bîr dikir; eger dawiya vê
rêwîtiyê nehata, ew her û her bidomiya! Lê eger vegera rêwîtiya min
tunebûya? Eger ez nikaribûma dîsan vegeriyama cîhana xwe!.. Hingê?..)
Min macerên rêwîtiyê hê di destpêka rêwîtiyê de dîtin. Ji
bêçaretî û bêgaviyê, min riya herî bi tehlûke ku ji rêwîtiye-
kê re diviya, hîlbijart. Min dê tevî dostekî xwe yê nêzîk xwe
tixûban bixista... Dostê min, ji bo alîkariya min, bi
min re dihat. Wî fedakarî dikir û dixwest alîkariya min bike.
Ez ne bawer im ku niha, li vê derê, ez dê bikaribkn bi awakî
xweş bînim zimên ka me çawan tixûb li pey xwe hîşt
û em jê bihurîn... û herweha di wê demê de min çi hîs kirin
û çi hatin bîra min. Meriv nikare hinek hîs, pejn û demên ku
hatine jiyîn, bi dû re, bi peyvan vejîne. Wisan dixuye ku
meriv divê wan bijî û bi tenê ji xwe re, belê bi tenê ji xwe re
veşêre. Mixabin, hêza peyvok û cimlan hê negihîştiye wê
katê ku ew bikaribin her tiştî ji nû ve biafirînin û bînin pê.
Lê, şev bû. Her tişt di nav bêdengiyeke bi keser û dîlsoj de
bû. Heta stêrkên şeva reş ku ji me re dibişirîn jî meriv digot
qey strana xerîbiyê bi awakî zîz û kezebxur digotîn. Beqên
doraliyên me jî li gor wî awayî bi qîrîn û nalîneke dilsoj

deng derdixîstin. Ez nizanim ka min, bi xwe, awakî weha
xeyal dîkk û ji xwe re çêdikîr yan ew awa bi rastî hebû û ez
12
jî dibûm pardarê kesera wî? Ez, li ser lêvên min rêzên şiîran
û di bêrîka çep ya pêsira çaketê min de guleke sor, di gel
dostê xwe dîmeşiyam. Di bin bêrîka pêsîra çaketê min de, di
bin gula sor de dîlê min hildiavêt.
Ew şev, şeveke payizê bû. Şev bi bayên keser, tirs û nena-
sî û nezaniya paşerojê ve hildibû...
Piştî rêçûyineke bi saetan em derbasi aliyê din yê tixûbê
bûn. Ev rêçûyin li ser niqta sifir ya wext û jîyanê bû. Hem
wext û hem jî jiyan li ser wê niqtê rawestî bûn. Gava em jî
tîxûb derbas bûn, em ji nû ve gihîştin niqta wext û jiyanê.
Di wê navberê de, gava me tixûb li pey xwe hîşt, ez careke
din vegeriyam û min li pey xwe nihêrî. Di tariyê de reişahiya'
çend darên ku ji min hineki dûr bûn, dixuyan. Dar li nik
hevûdu rêzkirî bûn û meriv digot qey wan pişta xwe dabûn
hev. Bayê sivîk pelên wan dilivandin. Ew weke stûxwaran
ber bi aliyê me de xwar bûbûn. Stêrk niha hîn kêmtir u
bêşewq bûn. Stêrkên ku êdîdiketin xew nedikeniyan... Qîre
qîra beqan hatibû bîrîn. Niha dengê dilên me yên ku hildi-
avêtin, dewsa dengê beqan girtibû. Hawîrdor di nav bêdengiyeke
dilsoj û dilşkestî de bû.
Min çend car bi keser nefes girt û da; min dixwest wê bîhna
ku bayê şevê radigîhand min, bikişînim hundirê xwe...
Min nedixwest ku ez ji wê derê dûr bikevim. Min ji dostê
xwe tika kir ku em li wê derê rûnin û hinek westa xwe bigirin.
Hema li wê derê, bê ku em li derekî çêtir bigerin, em li
ser axa sar rûniştin.
Dostê min di wê dema rûniştinê de qet nepeyivî û bi tenê
li doraxwe nihêrî. Ez jîbêdeng mam. Tu tişt nedihatin bîra min
ku em li ser bipeyivin. Bêdenmayin çêtir bû. Di wê dema kurt de
gelek tiştên cîhana ku min li pey xwe berdida, weke şerîdeke

sînemayê di ber çavên min
13
re dibuhurîn. Eşkere bû ku zelzelekê di mêjiyê min de pêl dida. Zelzeleke ku min baş fahm nekir ka çi ye... Rê, xaçerê û qelşên zelzelê ku her diçûn fîrehtîr dibûn, ez tev li hev dîkirîm. Min baş fahm nedikir, lê ez bawer îm li wê derê, di nav rê û xaçeriyên zelzela mêjiyê min de keser û zar, heye-can, jan, xemgînî û kêfxweşî hebûn. Belê, zelzele, zelzela hîsên cûrbecûr bû. Hîsên têvel ku ketibûn nav hev...
Ez bi dengê dostê xwe dîsan vegeriyam cîhê xwe, rex tixûbê. Me dixwest ku em herin. Berî ku şev li me bîqulibe diviya em ji wê derê bi dûr ketina. Em rabûn pê û me dîsan dest bî rê kir.
Li gor ku dostê min digot, di nêzîk de, li wan
deran gundekê hebû. Em dê berê biçûna wî gundî. Bi dû re jî em dê li ser riya xwe berdewam bûna. Em niha li aliyê din yê tixûbê bûn. Em niha hîn rehet, azad û bêtirs bûn.
(Fermo kalê rind!.. Te hay lê heye? Ez niha dîsan tiştan didim ber hev û dibêjim hîn... Hingura wê êvarê tê bîra te?..
Em li derveyi gund rûniştibûn û min ji te re behsa rojê dikir. Roj li hember me weke siniyeke sor dixuya. Ew diçû ava. Weke niha tê bîra min, hingê min weha got:
- Dan û standina merivihayê bi rojê re niha hîn çêtir e. Bi alîkariya pêşketina teknîkê merivahî niha roja xweşîk, tava spehîhîn çêtir fahm dîke.
Di pey re jî, min ew warên ku merivahî bi rojê re di nav dan û standîneke baş de ne, hijmartîn. Gava min dît ku tu bi sebir li min guhdarî dîkî û tu dipêyî ku ez xeberdana xwe biqedînim, hingê min got:
- Gelek baş e ku teknîk û pêşveçûn niha hîn zêdetir di xizmeta merivan de ye...
Gava tu dipeyîvî, te tu car rûyê xwe ber bi kesê ku tu pê
14

re dipeyivî, nedizivirand. Lê hingê te rûyê xwe ber bi min zi-
virand û got:
- Tu bê rawestin «hîn çêtir e, hîn baştir e, hîn xweştir e..»
dibêjî. Li gor çi hîn çêtir e, hîn xweştir e? Pîvanên te çi ne?
Ji dengê te dixuya ku te nedixwest ku tu hêrs û ecizbûna
xwe nîşan bidî. Rûyê te ber bi min, te ji min bersivek dipa.
Li gor çi? Min jî ev yek baş nedizanîbû. Li gor çi?
- Şerê cîhanê yê duwemîn... min got, ji bo ku ez tîştekê
bibêjîm. Wê demê rewş hîn xirabtir bû. Tiştê ku merivahiyê
pêk anîbû, hingê merivahiyê vedigevizand û dikuşt.
Ha... ha ji te re bersîva ku însan dîvê bipê...
- Hingê ez tengizîm:
- Min dikaribû mîsaleke din jî bida. Ji ber ku ev mîsal hat
bîra min, hema min ew got.
- Ferq nake, te got. Mîsalê te min qebûl e. Lê eger te mî-
saleke din jî bida, dîsan rewş nediguherî. Bersîva te çewt e û
çewtî ne di mîsalê te de ye. Çewtî di awayê fikirm û hiziri-
na te de ye. Gava tu yan hûn, yanê kesên weke te, dibêjin
«hîn çêtir, hîn baştir» hûn bi tenê tiştê herî xirab, tiştê herî
mirdar difikirin û dihesibînin. Lê belê, ma divê weha be?
Dema însan rewşa îro ya ku însan tê de ye, bi ya herî xirab
re bide ber hev, helbet, însan ji ya heye re şikur dike, jê razî
dibe. Lê, ma însan divê ya heye nede ber ya ku di esasê xwe
de diviya hebûya? Ya ku insan dixwaze? Ji ber ku te ew roj
nedîtine, tu nikai-î baş wan rojên şerê cîhanê yê duwemîn
hîs bikî û bizanibî ka ew çi roj bûn.
Ew roj, rojên qafilqedayê, rojên cehenemê bûn. Insan, însanetî, dinê dîn
bûbû.
Şer weke ruhistînekî ketibû nav însanan... Weke ku gur ketibe
nav keriyê pêz. Bi şûrê ruhistîn yê reş û bi xof dilê
15
însanetiyê diqelişî. Hêvî talan bûbûn. Ruhistîn û «neviyên
wî» kêfa xwe bi dilbîrînî û dîlşewatiyê tanîn: jan û êş bûbûn

şênahiyeke bêsînor.
Xaça reş, xaça bi koşe ya dewleta Elman evm, dilovanî, zîman
û dil kuştibûn. Weke îro tê bîra min; serokê belediyê Berlînê
yê wê demê rojekê weha gotibû:
«Cihû nikarin deynên xwe yên gazê bidin. Deynên
wan pir bîlind in. Ji ber ku ew pir întixar dikin û xwe bi gazê dîkujin...»
Belê, ew dema demeke weha bû.
Ew zilamê reş û jar ji bo ku ew bibe sergevaz û serdestê însan û însanetiyê, wî
bi mîlyonan însan dan kuştin weke kêrekê di dîlên me de
daçiqiye. Dîlê me hê jî ji ber wê kêra malkambax bî kul û
birîn e.
lcar, di şûna ku em wê kêrê ji dîlê xwe bi derxînin
û biavêjin, em tiştên ku bi qasî wê kêrê naêşînin, dipejirînin.
Hem jî bi çi hîmet û şukrî! ..
Tu di wê dera xeberdanê de westibûyî, kalê rind. Te dîsan ew
kêra malkambax bi bîr anîbû.
Kêra ku di dilê te de hatîbû daçiqandin. Dîlê te dîsan pê êşiyabû.
Em her du jî niha, piştî xeberdana te, êdî bêdeng mabûn.
Bîhn li ber te çi kiyabû û te dîsan dest avêtibû cixarê. Min jî bêdeng li te
guhdarî kîribû û niha bi tiliyên xwe tiştine li ser axê dinivîsîn.
Em demeke dirêj wisan bêdeng rûniştin. Piştî çend gulmên cixarê
tu dîsan hatî ser xwe. Min hêvî hebû ku êdî me-
sele hatibe bîrîn. Lê ne wisan bû... Te, weke ku tu bi
xwe re bipeyivî, dîsan dest bi xeberdanê kir:
- Çima em weha xwe, mêjiyê xwe, der û dorên xwe û tiş-
tan ji hev vediqetînin, didin ber hev, ji hev perçe dikin û bi
dû re jî dibêjin, «ev hîn baştir e yan jî ev hîn xirabtir e...»?
Çima?
Em her tiştî jiyan, wext, însan û însanetî, evm,
kêfxweçî, keser û jan, azadî...- ji hev vediqetînin, lîme lîme
16
dîkin û paşê jî wan didin ber hev... Bi vî awayî, yanê bi ji-

heweqetandin û liberhevdanê xirabiya herî mezin em, bi xwe, li xwe dikin. Sînor, qeyd û şert me ji me ji însan û însanetiyê bi dûr dixînin... Belê, te weha digot.
Ez çi bibêjim kalê rind?.. Nabe... em, merivên ku bi keft û leftên rojane dorgirtî ne, nikarin mêjiyê xwe yê perçebûyî û heşê xwe yê ku bûye sed beş, deng û pejn, ji van sînor, qeyd û şertan rizgar bikin. Nabe, kalê rind nabe. Mixabin nabe... Ez divê li xwe mikur werîm ku ez jî nikarîm vê yekê bikim.)
Gund biçûk bû. Ew ji çend xaniyên xwar û xirbe hatibû pê. Xanî di nav reşahiya şevê de weke siyên tarî dixuyan. Meriv digot qey, gund û xaniyên wî yên belengaz di nav tariya şevê de dîxwestin bi awakî bêdeng nefes bigrin. Weke ku xire xira mirinê bi ser wan de hatibe. Em bê dijwarî û zehmetî, her ji tixûb bi dûr ketin û gihîştin gund. Dostê min rûniştevanên gund dinasîn. Wi dikaribû bi hêsanî here her malî. Em wê şevê çûn mala ku di bîn darekê de avakiri bû. Mala xirbe ji koma xaniyên din hinek bi dûr bû. Xwediyê malê şivanekî bû. Wî dê, dotira rojê, ji me re alîkarî bikira û em bibirina bajarê ku nêzîkê gund bû. Şivan, di destan de tifmga wî, şaş bûyî derket ber derî. Min di wê tariyê de fahm nekir ka gava şivên em dîtin ew bi vê yekê kêfxweş bû yan tirsiya. Lê ji hûrnêrîna wî eşkere bû ku wî dixwest bîzanibe ka ev mêvanên şeva reş kî ne. Piştî lênêrîneke geleki kurt, wî dostê min nasî:
- Te dîsan, weke her carî, ez şaş û mat hiştim. Hûn di vê saetê de çi digerin li van deran?
17
Piştî pirsa şivên em ketin hundir.
Deriyê mala şivên biçûk û xwar bû. Derî hema li oda şivên vedibû. Mala şivên bi tenê yekçavî bû. Piştî ku şivên lampa gazê vêxist, tiştên ku li odê dixuyan, tiştên herî kêm yên maleke gundi bûn; li erdê hesîreke kevn û fireh, diwa-

rên çelpekkirî, di tenişta diwaran de kulavên raxistî û li ser kulavan jî mînderin. Di odê de, li ser diwêr lewhek hebû. Lewhe, dî nav çerçeweke xwar û şikestî de resimê Ka'îbê hû. Lewhe li ser diwarê ku li hember derî bû, hatibû hîldanîn û ew bi tîpên erebî ve tijî bii. Cih û nivînên şivên li quncîka xwarê, li erdê raxistî bû. Cih û nivînên wî li benda wî bûn ku ew dîsan şivên vegerînin cîhana xewnan.

Lê, şivan dil tunebû ku dîsan vegere nav nivînan. Ew dixebitî ku mêvanên xwe yên nevexendî biezimîne. Wî hema ji quncika ku li hember cihê wî bû, çend balif hiidan û anîn danîn ser mînderan. Bi dû re, ew beziya û çû bin derî û piştî biskê di destan de du tasên bi dew tijîkîrî, hat nik

Lê berî ku ew li nik me riane, wî ji me pirsî ka me çay yan qehwe dixwest. Piştî ku dostê min spasê wî kir, ew hat û li nik me rûnişt.

Şivan merivekî kin û qut, bi gewde û rûdagîrtî, simbêlzirav û porweşiyayî bû. Niha baş dixuya ku ew bi dîtina dostê min - û min - kêfxweş bû. Piştî ku ew rûnişt, wî destê çepê yê dostê min girt nav lepên xwe û bi ken got:

- Baş e, pir baş e... Me tu pir meraq dikir...

Em demeke kurt li ser rêwîtiya xwe, cihên ku em jê dihatin û rewşa merivên wan deran peyivîn. Wî jî di wê navberê de behsa gund û doraliyên gund kir. Şivan ji mêj ve bû ku li vî gundê biçûk dijiya li wî pezên gund û gundên dorali dîbirin çêrê. (Paşê dostê min jî min re behs kir; şivan bi berî

18

wexteke direj zewicî bûye, lê di destpêka zewacê de, jina wî dev ji wî berdaye û winda bûye. Jinik çûye li serhede yekî din kiriye. Piştî ve bûyerê şivan jî hatiye û li vî gundê bi cîh bûye û ji wê roje pê ve - be demên pewist - daneketiye bajêr.)

Piştî xeberdana me ya kurt, şiven ji me pirsî ka em birçî bûn yan na. Belê, em birçî bûn, lê tiştê ku me zêdetir dixwest kêhkê xew bû. Herweha, ji bo ku em bikaribin tîrs û westa malkambax ji xwe

bi dûr xînin, me biryar da ku em bîskekê razên. Min bi tene çaketê xwe ji xwe kir.
Berî ku ez çaketê xwe daînim ser balifan, min li gula bê-rîka xwe nîhêrî. Ew bûbû stûxwar û diçilmisî...
Xewn, ew xewna ku pêlên ecêb yên zelzela mêjiyê min radiwestandîn, ez hilgirtim û avêtim nav valahiyên xwe yên bê ser û ber. Ez pê re çûm û dî nav refên bêreng, bê-bîhn, bêpejn, bêtahm, betixûb û bewext yên valahiya xewnê de - bîskeke - geriyam. Li wê dere, di nav valahiya xewnê de ne şer, ne westîn, ne lebat, ne tirs, ne dilsojî û ne jî lez û bez hebû. Her tişt sakîn û aram bû. Heta refên valahiyê jî di nav bêdengiya xwe de diçerixîn û gêr dibûn. Bi qasî ku tê bîra min, di nav valahiya xewnê de tiştine berpêş dibûn û xwe nîşan didan. Carina di nav valahiyê de lingin derdiketin pêş.
Ling her ku diçûn mezintir dibûn.
Tevî lingan axa nerm jî berpeş dibû. Her tişt li we dere şiklê pêlên zeryayê girtibûn û ez li ser pêlan wekî mÛyekî zirav, tenik û sivik difiriyam. Lê tevlîhevî û valahiya xewnê hemû ev tişt di demeke kurt de dadiqultandm û winda dîkirin. Dî nav valahiya xewnê de deng jî hebûn. Dengên bi giram, qedirgiran û hezkirî... Ew deng weke fîzîna ba û wî-
19
zîna gule û berikê xwe digîhandin ber guhên min. Min baş jê dernedixist ka ev deng, dengên kê bûn û ji kû diha-tin. Lê gelek eşkere bû ku ev deng, ew deng bûn ku min jê hez dikirin û bêriya wan kiribûn. Ez wisan pê dîhesiyam ku ji wan dengan hinek yên miriyên min yên gorbehîşt bûn.
Min ew, yanê xwediyên bi zar, keser û hêsirên çavan bi rê kiribûn, min bi dilovanî û dilsojî ji wan xatir xwestibûn. Ez bawer im, hinek ji wan dengan jî yên evîndar, qedirgîr û rêzdaran bûn. Evîndar, qedirgîr û

rêzdarên ku êdî min dê nedîtina... Deng jî li gor gêrbûn,
çerxbûn û rabûn û daketina pêlan nêzîkî li min dikirin û
paşê dîsan ji min bi dûr diketin. Bi qasî ku ez têdihihîş-
tim, dengên hezkirî û dilovan dixwestin bi dengê dilê min
ve, bi tepe tepa wî ve bibin yek. Dilê min yê reben!..
û hesret û hesret û hesret...
Belê, li wê derê, di valahiya xewnê de hesret jî hebû.
(Hesretên ku dê her zêdetir bûna û tu car ji min bi dûr neketina.)
Hesret... Hesretên stûxwar, şkestî, qurmiçî, dilgerm û dilsoj.
Hesret... hesreta wextên aza û wekhev. Hesret... hesreta
azadiya nezincîrkirî. Hesret... hesreta gulên sor.
Ew gulên sor ku wekî ramûsanekê li ser sîngên evîndaran
bûn. Ew gulên sor ku wekî hêstireke çavan li ser qebr û
gorên qedirgîran hişîn dibûn. Belê, ew gulên sor ku weke
qewl û sondekî hezkirî, weke qewl û sondekî miqedes li
ser dilan bûn...
Hesreta azadî û gulên sor ku di nav vala-
hiya xewna min de dîxuyan, ez hildîgirtim û ber bi cîhekî
nas dibirim, maleke kevn û nexerîb.
Ez bawer im, ev mal, ew der bû ku ez tê de mezin bûbûm.
Min li wir rêzên xwe yên pêşîn nivisîbûn, li wê derê
20
Destên tîlîdirêj di nav porê min de geriyabûn. Niha di xewna min
de ew deriyê derve, ew bexça fireh, ew odên
ku di nav hev de bûn, ew diwarên spî û reş... ev hemû tişt
di nav xweşiyeke nedîtî de bûn. Her tişt, ji nişka ve, bi si-
hêra pêlên hesretê ve spehîtîr bûbûn. Qet tu tiştên bed û
mirdar li wê derê tunebûn. Her tişt li wê derê bi rengekî
zîvîn û helesor diçirisîn.
Gulên bexçê... ew gulên ku her sal ji nû ve vedijîn, niha dîsan
bişkivî bûn û li bendê bûn ku destekê were û wan hez bike,
li bendê bûn ku cotek lêv werin li wan ramûsin... Tam di wê
navberê de, gava destekê bi heyecan ragîhîşt û xwest guleke

sor jê bîke, hingê ez dîsan vegeriyam, hatim rîiyê cihanê, oda şivên.
Xewn û valahîyên wê ji nişka ve ji min bi dûr ketibûn...
Di oda şivên de jî weke ku hinekan dixwestin bila vege-
ra min ya oda şivên bê êş û jan be; ez bi dengekî delal yê
bilûrek hişyar bûm. Roja min ya yekemîn li vî aliyê
tixiibê bi dengê bilûrekê dest pê dîkir. Ma çi dikaribiî ji vê
yekê xvişeştir bûya?.. Şivan û dostê min jî hişyar bûbûn.
Di destên wan de tu bilûr tunebû. Wan di nav nivînên
xwe de serên xwe dabûn hev û bi dengekî nizm pise pis
dîkirin. Ez jî niha hişyar bûbûm. Me nediviya ku êdî em
xwe di nav nivînan de «vegevizînin.» Em hema rabûn ser ;
piyan. Xewa çend saetan bi kêr hatibû. Dostê min niha
hîn zîndetir dixuya û min jî xwe çêtir hîs dikir û ez li ser
xwe bûm. Piştî ku me dest li rûyên xwe şuştin, me
xwirînî kir û em ji odê derketin ber derî. Roj
bi tîrêjên xwe yên jar li tenik dibişirî. Bayê sibê
pelên zerbûyî yên dara ku ber bi asmên hildikişiya, hîldi-
dan. Xaniyê şivên ne tu xanî bû; diwarên wi bi kevirên
reş yên granîd hatibû lêkirin, lê belê, bi xeşîmî. Xanî
21
wisan dixuya ku merîv digot qey, ew hildiweşiya. Ban bî
herîya kakirî ve hatîbii dagirtin. Ev ban, bana herî basîd
ya wê deverê bû; di ser diwaran re bi çend bihustan ji hev
dûr, beştînên darên dirêj seranser dirêj kiribûn û bî mirdîyaqan
ve navbera beştan dagirtîbûn û bi qasî
pîyekî ax berdabûn ser. Bî tenê hewqas... Xanîyên dîn
yên gund jî - kêm, zêde - weke xaniyê şîvên bûn. Ev gund,
cîhekî bêdeng, dî halê xwe de bû. Gund herçend di
navenda cîhanê de bii, lê ewçend jîjê bi dûr bû. Weke ku
ew jî cîhanê xeyidî bû.
Ev gund dî nav kavîl û wêraniyeke wisan de bû ku dilê
merivan pê dişewitî. Belê, gund, weke gundekî xîrbe ii
terkkirî dixuya.

Di tenişta xaniyê şivên de xaniyekî din jîhebû. Ev xa-
nî jî weke yê şivên bii. Lê, ji yê şivên hîn bîçiiktir ii
pêrîşantîr bû. Ew dengê delal ji wê derê dihat. Dengê
bilûrê bi awakî zîz li zelal her û her dirêj dibû. Dengê
delal, xweşiya bêpeyv, ji ser serên me re difîrîya, xwe
dîgîhand bayê û pê re ber bî asmên diçû. Giyayê lî ser ax,
pelên darê, tava lî ser serê me jî biibûn şîrîkên bilûrê û pê
re distran. Ji mêj ve bû ku min xwe evçend rehet û sakîn
hîs nekirîbii. Xweşiyên cîhana çîrok û şiîran lî doraliyê
min govend girtîbûn... Dî wê navberê de dostê min lî min
vegeriya û got :
- Serdar, ho Serdar... Çawan, dengê bilûrê çawan e?
Xweş e, ne wisan?
Ma xweşî jî qîse bii! Deng ecêb bii. Min jî lê vegerand:
- Ev dengê meliil û dîlovan merivan sermest dîke. Deng
pîr nazîk û zelal e, lê bi qasî vê yekê, ewçend jî xurt û qa-
yîm e. Deng xwe digihîne ruh û giyanê merîvan...Bilûr-
22
dêmena gund yê bî keser temam dike, lê xweşî û dUşa-
hiyek jî didîyê. Wisan dixuye ku tilîyên lî ser bilûrê dîge-
rin, gelek hoste ne...
Min ev cimla dawîn gotibii ku ez, belkî, bîkarîbîm fêr
bibim ka xwediyê bilûrê kî ye. Lê ji kesî tu deng derne-
ket. Ez jî - îcar - li şivan vegeriyam û min jê pirsî:
Ev dengê delal rengekî xweş û dêmeneke melîil
direşîne ser gundê we. Kî lêdixîne, xwediyê bilûrê kî ye?
Piştî kêlikê rawestmê, şîvên bî ken got:
- Xwedîyê bilûrê kalê me ye. Kalê gundê me...
- Ma ew bi tena serê xwe dîmîne, bi tenê dîjî, ew çima
dernakeve der?
Pirs, li pey hev, ji ber xwe ve dîhatin. Min nikaribii wan
rawestînim.
- Belê, belê ew bi tenê dijî. Ma ew dê çima derkeve ber

derî? Ew her rehet e, ew hem li hundîr, hem jî lî derve rehet e. Jê re, jî kalê me re Hhundîrbûn yan lidervebûn zêde ferq nake.
Min dîsan ji şivên pîrsî:
- Çawan ferq nake, çawan ew lî her derî rehet e?
(Kalê rind, hingê min nizanîbii çawan tu li her derî rehetî, çima tu li her derî eynî rehetîyê dijî û dibînî...
Helbet, wê gavê min ev yek nîzanîbii.
Ez hê jî nizanim ka şivên ew cîmle di kîjan manê de bî kar anî. Lê jî bo mîn, ev yeka, yanê rehetîya te ya her derî nayê mana tarîtî li şevên reş. Tu carî nayê wê manê. Belê, te bî tarîtiyan ve, bi şevên reş ve dostiyeke germ û xweş pêk anîbii. Lê, min qest ne ew e. Belê, rast bû: tu li her derî rehet biiyî. Lê jî bo ku min bîkaribûya fahm

23

bikira ka ev rehetî çî celeb rehetî bii, min divîya xwe bîgîhanda wan tiştên ku te ji min re hîştîbûn. Ew tîştên hêja û giranbiha. Ew tiştên ku bi sebra zêrîngeran û keda bîreweran ve hatibûn afîrandin... Jibo vê yekê jî, jibo ku ew tiştên te bîketîna
destê min, berî her tiştî, min divîya
tu bînasîya, li te guhdarî bikira, nêzîkî li cîhana te ya awarte bikîra...
Ew
gava ku em lî ber deriyê şivên
rawestîbûn, hîsên
mîn têvel bûn. Herwekî ku min got, min cîhaneke dil-germ li pey xwe hîştîbii û riiyê min ber bi deverên ne-nas bii. Lê tiştekî weke niha tê bîra mîn; min dixwest te bibînîm, li nik te riinîm. Çima? Sedem ewçend pir bûn ku nayên hejmartin. Niha, ew sedem hemû nayên bîra min jî. Ez wê sîbê lî ser xwe bûm

û dengê bilûra te xwe gîhandîbû kiirayiyên ruhê min...
Bilûra te, dengê bilûra te ez ji gund gîrtim û bi xwe re
Birim nik du bilûrên dîn jî. Du bilûrên ku li oda herî
mezin ya malekê bûn. Yanê ew mala ku êdî li pey min,
di nav xewnan de mabii. Ew bîlûr li ser diwarê ku li bexçe
dînîhêrî, bî çaprazî hatibûn danîn. Ew perçên wê odê
bûn. Wan bi xweşî û spehîtîya xwe awayê eşîrî yê odê
baş nîşan dîdan. Ew bilûr ji bav û kalan mabûn. Pir tili li
ser wan geriyabûn, pir lêv ew fîkandibûn, pîr hunermend
jî wan dengîne xweş, melîil, nazik û xurt deranîbûn.
Gava dengê bilûra te li wê derê, lî ber deriyê şivên ez
sermest kîrîm, ez lî ser wan her du bilûrên ronî û destên
ku ew mist dîdan, fîkirîm. Destên ku destên min yên biçûk
digurtin, ez dîbîrim bajêr, ji min re fekî, şekir ii
şîrînahî dikirîn, ez kêfxweş, serfiraz û dUgerm dikirîm...
Ew destên bî emr û qermîçî ku ez dîgirtim hembêza xwe
24
ii porê min mist didan, car caran bilûrên ronîjî ji dîwêr
datanîn. Hîngê, gava tili li ser yek ji wan bilûran digeri-
yan, ruhê min yê pepiik weke pêlên zelal bi hêlekane
radîbû û dadîket.
Paşê, rojek ew destên bi emr ku her gav li ba min bûn,
ez dîhewandîm û kêfxweş dikîrim, ji nişka ve, wîndabûn.
Ez ketim pey destan... digel wê hindê ku ez lê dîgeriyam,
êdî min
hew dikaribii wan bidîtina. Ew winda bûbûn.
Piştî demekê, gava coteke destên din ragihîştui bilûran, ez
têgihîştim ku êdî ew destên kal dê tu carî venegerîn.
Hingê cîhan li ber min reş bû, ez gêj û mat mam. Hîngê
pêt û çiriisk dî dîlê min de rabûn, êş û jan di dîlê min de
werhatin. min tu tişt fahm ne dikir. Ew destên ku min
jê gelek hez dikirin, çima, ez terk dikirim? Çima wan ez di
nav derd û keseran de dîhîştim, ez bî tenê berdîdam?

Ew destên nii ku rahîştibûn bUiiran, destîne fireh îi
cîwan bûn. Ew jî destên bi emr bêtîr bi mii bûn jî... Ev dest
jî eynî weke destên bi emr ji min hez dikir û destên min
pêdîgîrtin. Wan jî porê min mist dida. Lê min wext dîviya
da ku ez hînî wan destên cîwantîr bibûma.
Niha, piştî windabûna destên bî emr, destên ciwantir dê
H ser bilûran bigeriyana. Wan dê erka ezîz ya eşîrî bi cîh
bîanîyana. Wê gavê min tiştekî pir û pir meraq dîkir; ka
bilûrên ronî ev guhertin çawan hîs dikir? Belê, guhertî-
nek qewîmîbû.
Destên bi emr wînda biibûn û destîne
ciwan ew wergîrtibûn. Wan jî wext dîviya ku bîelimin van
destên nîi. Ew jî gêj û mat mabûn? Pêt û çiriisk dî dilên
wan de jî rabûbûn? Ew jî nîvê şevan radibûn û dîçûn lî ew
balîfên ku destên kal, berê, li ser dixuyan û niha dî nav
valahiyeke bî keser de bûn, dînihêrîn?..
25
Belê, hingê, gava min bilûra te guhdarî dikîr, ev tişt ha-
tîn bîra mîn. Herweha lî wê derê dengê bilûra te tiştekî din
ji bi min da zanîn; yek jî ew êş û janên ku qet ji min bî
dûr nakevin û qet ez nikarim wan bi derkîm, jî bo wan
bilûran e.
Belê, bilûran janek jî di dilê min de weranîbûn.
Mixabin min tu carî ranehîşt bilûran û destên mîn
li ser wan negerîyan, lêvên min ew ranemîisandîn. Min
nikaribû wezifeyên xwe yên eşîrî dewr bîgîrtina.
Ew salên ku êdî destên min dikarîbûn li ser bilûran bige-
rîyana û min erkên xwe yên eşîrî werbîgirtîna, di derên
dîn de derbas bûn. Min ew salên xwe di gîrtîxane û bajarên
mezin de hîştîn. Ew sal lî wan deran bîhurîn. Piştî wan sa-
lan jî, êdî min ne keys û ne jî wext hebû...
Ez êdî çi bibêjîm?.. kalê rînd, min dixwest te, ew kesê zî-
ravbîhîstiyar bibînîm. Ez çî bibêjîm? Min jî kal, pîr û tîştên

ku êdî li pey roja me mane, hez dîkirîn, min ew meraq dîki-
rin. Ez çi bîbêjîm... evîn û meraqên min lî ber derîyê şivên
dîsan hîldîbûn. Belê, min dixwest xwe bîspêrim kes, tîşt,
deng û pejnên kevn û kevnar...) Min ji şivên re got ku ez dîxwazîm
kalo, xwediyê bilûrê bîbînim. Şivan bersîv neda. Dewsa şivên dostê
mîn bersîva min da:
- Dev jê berde, meriv divê zêde nêzîkî li kalo neke. Pira-
niya caran ew dîxwaze bî tenê bimîne.
Ev yek hm bêtir bala min kîşand. Rewş balkêş bii. Çima
wî dîxwest bi tenê bîmîne, çima ew li her derî rehet bû?
Min çend carên dîn jî, ji şîvên tîka kir ku em bi hev re he-
rin cem kalo û wî bîbînîn. Dema şîvan dît ku ew zîi bi zii
nîkare jî lava û tîkayên min rîzgar bîbe, hîngê wî got:
26
- De baş e, de bisekine ez herim û jê bipîrsim.
Piştî gotina xwe jî ew ber bi aliyê kalo de çû.
Gund bî awakî bêdeng dest bi jiyana wê rojê kirîbii. Hej-
mara xaniyên stûxwar yên gund ne zêdeyî dehan bûn. Hemû
jî weke xaniyê şivên hatibûn avakîrîn; kevîrên reş qor bi
qor lî ser hev hatibûn danîn û ax berdabûn ser ban. Meriv
digot qey xaniyan dixwestin hevûdu ji hawirdor biparêzîn.
Wan pîşta xwe dabûn hev û bi hev re komekê çêkîrîbûn. Hi-
nek bi pencere û hinek jîbê pencere bûn. Derîyên hemû xa-
niyan jî ji text bûn. Ji me hinek dûr, li ber derîyekî, jînekê
di nav tiştekî stûr de tiştîne dişûştin. Çend zarok - jî jinîkê
hineki bi dûr - rawestabûn û li me dinihêrîn. Zikên yek, du-
duyên zarokan wîsan werimîbûn ku meriv jî dûr ve ew dîdî-
tin. Çend ker û seg jî lî doralî digeriyan. Mirîşkin jîhebûn;
ew bî qaqe qaq di navbera jinîkê û meydana gund de digeri-
yan.
Dî meydana gund de kaniyek jî hebû. Wîsan dîxuya
ku avahiya beton ya gund bi tenê ev kanî bû. Kanîyê
germî û jîndarîyek jî dida gund. Ew gelek spehî dixuya.

Lî holê tu mêr nedîxuyan. Gava min ev yek jî dostê xwe pksî, wîgot:
- Ew niha li ser erdê xwe ne. Di berbanga sîbê de ew diherin ser erdên xwe. Her çibe, piştîku em hatin gund, ew çûn. Jiyana van mirovan ax e, erd e. Ew nikarin ji axê veqetin. Eger tu meraq dikî ka çima şivan neçûye ser karê xwe, ez ji te re bibêjim; min jê tîka kir ku ew bi me re heta bajêr were. Piştî ku tu ketî xew, ew çû û gundiyekî dît da ku gundî pêz xe derxe çêrê. Ew divê îro bi me re be, karê me pê re pîr e, em pir hewcedarên wî ne...
Di vê navberê de şivan vegeriya û hat nik me. Bersîva kalo na bû. Serê sîbê bû û kalo dixwest bî serê xwe bîmîne. Tîş-
27
tên ku kalo ji me re bigotina, tunebûn û herweha kalo nedixwest me - ya rastir min - bîdîta. min bersîveke weha nedîpa. Ev yeka ne li gor mêvanperweriya gundiyan bû. Niha jî gava ez van rêzan dinîvisim, tê bîra min ku lî wê derê ji devê mîn bî tenê peyvek derket:
- Heyf ..
Lê tîştekî ku min bîkaribûya bikîra jî tunebû. Ez bêgav mabûm. Em bîskeke din li gund man. Dengê bilûrê nehatîbû birîn. Me hem dengê bilûrê guhdarî dikir û hem jî tiştên ku diviya me bi xwe re bibirana, didan hev. Paşê jî em bi rê ketin.
Em dê bi peyatî heta bajarê nêzîk bîçûna. Jî wê derê pê ve jî, min dê bi tena serê xwe - rêwîtiya xwe bîdomanda û ber bî alîyê welatekî nîi, Swêd û bajarekînîi, Stockholmê biçûma. Dostê min dê bi min re heta bajarê nêzîk bîhata û piştî ku min dostên wê derê, yên bajêr nasîn, ew dê dîsan biziviriya. Ez hê di destpêka rêwîtîyê de bûm, hê gelek tişt hebû ku diviya bi cîh bîhatina.
Rîya zîrav ya gund ne bi rêk û pêk bii, tê de meşîn û birêveçûn geleki dîjwar bû. Axa rê ku hê baran nedîtibii, di her

gavê de toz radikir. Em demeke dirêj dî bîn tavê de meşîyan. Tav her ku dîçii germtir dibû. Şîvan li rê her behsa zehmetî îi dijwarîya rê kîr. Li gor ku wî digot, rê dî zivistanan de hîn xirabtir dibii. Hingê meriv nedikaribû ji celb û heriyê bimeşiya. Wê wextê dan û standina gund bi cîhanaderve re dihat bîrîn. Ew dan û standinên ku jixwe gelek kêm bûn, yekcar qut dîbûn.

Şîvên weha behsa dijwarîyên rê dikirîn. Lê dî nîvê rê de dostê min jî nîşka ve sekînî. Em jî pê re sekinîn û lê vegeriyan. Wî dest pê kîr, bî dest li bêrîkên xwe geriyan. Piştî kêlikê wî bî dengekî tengizî got:

28

- Xwedê bela xwe bîdîyê! We dît çi qewîmî? Cîzdana mîn ne li ser min e! min ew îlam li derekî xist... yan jî li derekîjî bîr kîr.

Şîvên di wê navberê de ji dostê min re got ku heye ku wî cîzdana xwe lî mala şîvên ji bîr kiribe.

- Belê, heye ku wisan be, dostê min got. Lê, hîngê em divê dîsan paşde vegerin. Wext dê hinek li me teng be, lê em çawan bikin? Weke din tu tişt ji destê me naye. Ez dîvê cizdan bîbînim.

Hingê min jê re got:

- Li ba min pere heye, têra me dike. Tiştên ku te divên, tu dîkarî bi van peran bikirî. Jîxwe tu dê dîsan paşde dikarin di bîskekê de herin wê bigrin û dîsan vegerîn.

Edî tu tiştê ku min bigota, tunebii. Em diviya paşde vegerîyana.

(Kalê rînd, te hay lê heye? Em dîsan bêr bî te dîhatin...

Dî tabloyê de, di lewhê de diviya şopên firça te hebûna û paşê, piştî demeke dirêj min şopên firça te hilbîanîyana. Jîbo vê yekê jî, me sedemekê divîya. Me diviya - lî gor qaîde ii prensîbên tesadufan - jî xwe re sedemek peyda bikîra da ku em dîsan vegeriyana gund. Belê, dîgel ku te nedixwest, em

dîsan ber bi te dihatîn, em dihatin nik te.
Ez nizanim çima... lê wê gavê, dema em dîsan ber bi te
dihatîn, lî rê, ez li hechecîkekê fikirîm. Lî Hechecîkekê ku
te jê re hecre|îk digot. Berî ku siûda min, yanê sîiida merivê
29
Kurd
Serdar Azad jî bibe wekî siûda hechecîkan, min bî
hechecîkê ve hevaltîyeke paqîj pêk anîbû. Belê, hevaltîya
me, hevaltiya zarokeki bîçiik û çîvikeke bîçûk weke ava zelal bii. Ez niha nîzanîm, me
çawan ji hevîidu fahm dikir, me çawan li hev dîkir... Heye ku hevaltiya me - bi awakî dan û standina hîsan bû.
Tiştên ku di derheqê wê de niha tên bira min, heye kujî
rastiyê geleki dûr bin. Lê, ma xatirên xweş, bî xwe ji, ne hi-
nek rasti, hînek xeyal û hinek jî dîlkirîn în?..
Ew çîvîkeke bîçiik û pepîik bû. Çavên wê yên hiir her di-
birîqîn. Me, (ez, bav, dê li kalîkê min) dizanîbii ku ew jî
der û deverên germ dîhat. Lê jî kii, jî kîjan deveran?
Me ev yek nedîzanîbii. Dîbe ku ew jî çoleke qijqîje dîhat.
Yan ji gîraveke ecêb, ji deryayên bêpêl û bêdeng yan jîjî
darîstaneke rengîn... Ew bê qîse û peyv, lê bi sir û sîhêr bû.
Ew, her bîhar, dema tebîet ji nû ve vedijiya, derdîket îi
dihat. Di oda herî mezin ya mala me de hêlîneke wê hebû.
Hêlîna wê di nav maxan de bû. Ew her bihar dîhat û li wê
derê bî cîh dibii. Hêlîn ya wê bû, wê bi xwe ew ava kîrîbii.
Gava min dengê wê yê zîrav û zîz dibihîst, hîngê min fahm
dikir ku dîbîstan lî ber gîrtinê ne. Piştî ku ew dîhat û di hê-
lîna xwe de bî cîh dibû, demekê, ewbîhêlîna xwe ve mijîil
dibii, ew ji nû ve ava dîkir û dî wê navberê de der û dora
xwe dinasî. Dema wê fahm dikir ku doraliyê wê ne dijmin e,
hîngê ew bî firê dîket û heta nik me dihat. Ew dîhat û li ser
serê min difîrîya. Wê bî vî awayî dixwest nîşan bide ku wê
hevaltîya me jî bîr nekîriye. min jî du tas tîjî qîit û av dikirin

ii li kêleka xwe datanîn. min dizanîbii ku ew dê
bî kêfxweşî were nik min venişe û ava xwe vexwe, qûta xwe
30
bixwe. Wê her car kêfxweşiya xwe bî baskên xwe
nîşan dida; bi firê dîket û baskên xwe diçerpîtandin.
Ew weke melaykeke biçûk xweş, melûl û dîlgîr bû. Hem
kêfxweşî û hem jî derd û keserên wê - ne li ser axê - di as-
manan de bûn. Ew her di asmanan de difurîya û berbîtava
xweşik diçii. Ew bûbû beşek, ji mala me. Ew di bîharê de
dihat, bî me re dibû pardarê tava germ û dî payizê de
difiriya û diçii da ku îcar bi hinekên din re tava germ parve bîke.
Lê, ew biharekê nehat. Tebîet dîsan vejîya, dibistan ketîn
bêhnvedanê, lê ew nehat. bû havîn, ew dîsan nehat. Rojên
havmê bihurîn, ew dîsan nehat... Min wê bihar û havînê car
bi car deftera xwe ya biçûk derxîst û lê nihêrî. Defter bî tîp
ii xêzên min yên xeşîm ve tijî bûn û di nav rûpelên deftera
min dc piirtên wê yên tenik jî hebûn. Piirt dî nav rîipelan de
dixuyan. Lê, ew bi xwe nedîxuya. Bi hatina zîvistanê, êdî
min hêvî nema. Hêviyên min şkestin; ew dê hew bîhata. Lê,
di demeke kurt de hêviyên nû dewsa hêviyên kevn û şkestî
girtin; hechecik dê di bihara pêş me de bihata. Ew dê bîhata
ii li nik rnin venişta.
Piştî payiz û zivîstanê, bîharekê din jî hat. Lê, hechecik
wê biharê jî nehat. Çima, çima? Gelo tiştekî lê qewimîbû,
dilê wê yê hûr rawestibû? Derd û keseran lê rê gîrtibû? Wê
dev jî mihacîrtiyê berdabii û li nik hinekên ku jê hez dikir,
bî cîh bûbû? Hingê çima ne lî nik me? Çima ew nedihat?
Mîn tu carî bersîva van pirsan ji tu derî wernegirtin. Lê,
pişti dîi bîharên ku bê wê derbas bûbûn, rojeke biharê, gava
ez westiyayî û di destê min de çanta min ya bîçûk ez ji
dibîstanê dihatim, guhên min bi dengekî ve tijî bûn. Ew
dengê ku êdî min jî bîr kîrîbû, yê wê bû... Çîv çîva wê bû...
31

Tîştê nebiiyinê qewîmibû...
Ew hatîbii, kalê rind, ew hatibû. Hechecîk hatîbû...)
Dema em vegeriyan gund, me dît ku kalo lî derve, li bin wê darê ku li kêleka xênî bû, rûniştiye. Ez bi vê yekê kêf-xweş bûm. Xwediyê bilûrê niha li derve rûniştibû. Min dika-ribû, ez niha bi hêsanî nêzîkî lê bikim. Dema dostê min îi şîvan ber bî aliyê xênî çûn, min jî berê xwe da ber bi kalo. Mîn, hinek jî dûr ve, sîlav dayê û ez ber bî wî çûm. Ew li bîn sîya darê, lî ser kulaveke sor riinîştibii û bilûra xwe paqij di-kîr. Gava ez çend gavên din jî nêzîkî wi bûm, hingê min çêtîr dît ka wi çî dîkir; wî bilûra xwe bî kakilên gîizan mîst dîda! Wî bi lez ber bi aliyê min nihêrî û silava min wergîrt:
- EUeykumesselam...
Wî, bî dii silavê re, pksî:
- Ma ne, tu lî ba şivên bûyî? Tu ne ew kes î?..
Mîn bersîv nedayê. Wî dîsan xeberdana xwe domand.
- Naxwe, hîin neçûn bajêr? Çi bû, çima hiin paşde vegeri-yan?
- Dostê min cizdana xwe li van deran ji bîr kiriye, em bê-gav man ku vegerin, min got.
Wî karê xwe domand û got:
- Belê, belê... ha weha dibe. Gava însan divê tu tiştîji bîr neke, hîngê însan tîştine ji bîr dîke... Eger tu dixwazî cixare bikêşî, fermo ji xwe re bipêçe.
Min cîxare nedikişand, min spasî wî kîr. Di wê navberê de em hinek bêdeng man û min li wî nihêrî. Ew gelek kal, gelek kin, gelek hîir û gelek jar bû. Hestîyên riiyê wî derketibûn derve û gumên wî vekîşîyabûn. Çermê laşê wîqermiçîbii îi rehên wî di ser çerm re baş dîxuyan. Tiştên ku lê bûn, gelek basîd bûn; kirasekî spî û dirêj û şepikekî fireh.
32
Di wê navberê de dostê min û şivan jî hatin. min - ew hê lî dîir bûn - ji wan pîrsî ka wan cizdên dîtibû.

- Belê, me ew dît, dostê min got. Gava ez şeva bihurî razam, min ew têxist bin doşeka xwe. Paşê jî min ew jîbîr kîr...
Li wê derê dostê min xeberdana xwe birî û sîlav da kalo. Dema dostê min û şivên silav dan kalo, ez ecêbmayî mam. Hingê min riştekî ku min nedipa, ferq kîr. Kalo jî silav da wan û gava wî silav li wan vegerand, wî serê xwe ji bUiirê rakir û li wan nihêrî. Kalo lî wan dinihêrî, lê çavên wî di valahiyê de bûn. Wî li valahiyê dûiihêrî. Belê, kalo kor bii... Ev yeka ku min hay lê tunebû, hîn bêtîr bala min kişand. Kalo dostê min ji dengê wî nasî. Wan dest pê kirin û hal îi xatîrên hevûdu pîrsîn. Paşê jî kalo pksî ka em çawan jî tîxîib derbas bûbûn. Di dewsa dostê xwe de, min bersîva vê pirsê da:
- Ez nîzanim ka merîv bibêje baş bû yan jî xîrab? Me xwe gîhand vê derê... helbet, ev tiştekî baş bii. Lê, ez divê vê yekê jî bibêjîm; ev rêwîtîya ha, wekî rêwîtiya pîra Siratê bû. Merîv gelek tişt jê fêr dibe, lê gelek ditirse jî. Ez bî xwe pir tirsîyam.
Kalo ez guhdarî kîrîm û paşê jî hêdî hêdî kenîya û got:
- Na, na... Hîin divê neheqî li xwe nekin. Eger hiin xurt ii jîr nebûna û we ev xurtîya xwe nîşan neda, hîngê hîin dê ewçend netksîyana jî. Ma tirs çi ye? Ma tirs dîkare bê xurtiyê hebe? Tirs xwîşka xurtiyê ye. Herweha hûn dîvê ji bîr nekin, jiyana me, der û dorên me bi tirs û xurtîyeke nedîtî hatiye gîrtin û pêçandîn. Em, însanên vî welatê dî navbera tirs û xurtiyê de diçîn û tên.
(Kalê rînd, ev çî qîse û peyv bûn?.. Ev peyv ne li gor
33
awa û rebenîya gund bûn. Ev celeb xeberdan û gotin ne ya gundiyan bû. Tu gundî bi vî awayî behsa tîrs û xurtiyê nedîkir û nikaribû bîkîra. Gundiyan dîkarîbûn bî gelek awan behsa tirs û xurtiyê bikîrîna. Lê ne weke ku te behs dikir.

Gundiyan tirs û xurtî nedikîrin xwişkên cêwîk, yan ji xwişk ii bîrayên hev.. Ji bo ku meriv bîkaribûya xwe bîgîhanda van peyvên rehet, lê tîjî û manedar, merîv dîviya pir tîşt dîtîba ii li pey xwe berdaba. Pir tecrube û zanîn diviya li pey van peyvan hebûna. Dema tu dîpeyivî, min ev tişt hîs kirin.
Tu dizanî... hinek xeberdan hene ku carina bî saet, roj û heftan dom dîkin, lê ne jîndar in, merîvan nahejînin, sermest nakîn, di dil û mêjî de pêl nadin... Ev celeb xeberdan tên gotîn, tên bîkaranîn û bi dîi re jî wînda dibîn, dîherin. Bêşop derîn. Merîv nîkare şopên wan hilîne. Ez çawan bibêjun... xeberdanên weha weke meşeke, gereke, birêveçûneke pêxwas û serqot in.
Meşeke, gereke, birêveçûneke
pêxwas û serqot di stêrîkeke mirî de. Li wê derê her tişt mirî ye, her tişt vemirî ye, tîştê ku meriv vejîne, keşf bike nemaye.
Lê, carina jî hinek demên kurt yên xeberdanan hene. Xeberdanên ku zêde nehatine neqişandîn. Xeberdanên ku kin, kurt û tîjî ne. Xeberdanên weha dî dil û mêjiyê meriv de pêl vedidîn, coşa merîv dîkelînîn û meriv - digel ku ew kin ii kurt în - qet naxwaze ku ew biqedîn, kuta bîbin. Xeberdanên weha hê di peyva yekemîn de bala merîv dîkişînin.
Ev xeberdan weke rêwîtîya li ser rîya rojê ne; germ in, bi heyecan în, bî sihêr û esrar în. Herweha meriv ji wan gelek tîşt dîpên.
Ez di bin tesîra cîmlên te yên kurt de mabûm. min dixwest, ez ber bi rojê herîm.
34
Em hi xwiqkên cêwik; hi tirs û xurtiyê ve kêfxweş, dilşad û serfiraz dibin...
Paşê, piştî vê xeberdanê bi demeke dirêj, ez dê fêr bûbûma ku lî pey van cimlan emrekî dirêj û jîyaneke rengîn hebû. U emrê mîn, emrê Serdar Azad yê sirgiinjîdê careke din bida

zanîn û îspat bikîra ku ev cimle rast e, rast e, rast e...
Ew
peyvên ku ber bî êşîga xweşîyên windabûyî û jî-
bîrbûyî, ber bi hewşa qise û rindiyên kevn û kevnar gav dav-
vêjin, çiqas xweş în!..)
Dostê min û şivan hê lî ser pîyan bûn. Wan dîxwest ku em
hema dîsan bi rê kevîn. Min jî - digel ku wext kêm bû - dîx-
xwest, em bîskekê li ba kalo rîinîn. Kalo her bî karê xwe ve
mîjiil dibû. Wîsan dixuya ku şivên û dostê min ez weke mê-
van dihesîbandîm û jî ber vê yekê jî, ew razî bûn ku em
bîskekê li nik kalo rîinîn. Gava min ev yek jî kalo pirsî, wî
dîsan bersîveke ecêb da:
- Ez çî bibêjim? Jixwe, hîin li gor daxwaza dîlên xwe lî vê
derê ne. Kesekî bang we nekiribû. Hiin bi daxwaza xwe ha-
tin û hîin dê dîsan bi daxwaza xwe herîn. Ne hewce ye ku
êdî hiin ji min bipîrsîn ka ez dixwazim hiin rîinîn yan na. Bî
qasî ku em bîkarîbin we biezimînin, çay û qehwa me heye.
Eger wextê we ji bo rûniştinê heye, fermo rûnin, na ku tu-
neye, hingê bila oxîra we ya xêrê be...
Hîngê şîvan ber bî malê çû û dî rê de got:
- De baş e, wê gavê em riinin û bi hev re çayekê vexwîn.
Ez herim çayê dayinîm ser êgir.
Dî wê navberê de dostê min bi kurtebîrî jî kalo re behsa
mîn kîr:
- Serdar, dostekî min yê kevn e. Me bî hev re li Stembolê
35
di fakulta hîiqiiqê de dixwend.
Bi dû xwendina xwe re wî dest bi karê xwe kir. Wî hem karê
xwe kir û hem jî ji kovar û rojnaman re tiştîne nivîsîn.
Niha jî ew mecbûr ma ku ji welêt derkeve. Wî her tiştê xwe
li welêt berda û bi rê ket. Ez dê pê re heta bajêr herîm û
paşê dîsan bi şiin de vegerim.
Lê baş dixuya ku tiştên dostê min digotin, bala kalo ne-

dikişandîn. Wî bi tenê Stembol û ew bajarên din yên mezin ji min pirsîn. Min jî bî kurtebirî li ser Stembol û ew bajarên din yên mezin tiqtine jê re gotin. Wî hêdî hêdî serê xwe hejand û bi dengekî nizm got:

- Ez bawer dikim ku ew der jî niha gelek xirab bûne. Ew der jî niha bûne wekî koxa mirîşkan; însan hevdû dixwîn û dîperçiqînin û tê de nefes nayê girtin. Ez bawer dîkim, niha li wan deran bîhn li însanan diçike.

Dengê wî baş seh nedibû. Meriv diviya geleki nêzîkîlê bî-kira ku bîkaribûya dengê wî bibîhîsta. Ew weke ku bî xwe re dipeyivî.

- Belê, belê, eynî wîsan bûye, min got, bi hêviya ku ez bi-karibim xeberdana me dirêjtir bikîm. Ew bajarên mezîn êdî ne tu cîh în ku merîv bikaribui tê de bijîn. Niftisa bajaran e-cêb zêde dibe. Bî sed hezaran meriv, bi hêviya jîyaneke nii, bar dîkin û tên bajaran. Rehetî, mal, kar, dezgeh tune. Jîxwe trafîk bûye weke ruhistînekê. Ev rewşa ha haletê ruhiyeke wisan aniye pê ku êdî kes li kesî guhdarî nake, kes jî kesî re xwedî dernayê. Merîv bûne bedbext, xemgîr û bêkes... Ji wî deng dernediket. Ez baş tênedigihîştim ka ew lî min guhdarî dike yan na. Mîn, bi hêvîya bersîvekê, jê pirsî:

- Hûn qet lî wan deran man? Min nedikarîbû meraqa xwe veşêrîm. min dîxwest wî

36

binasitn. Lê, wî bersîva pîrsa min neda. Di şûna bersîvê de, wî bilûra xwe mist da û got:

- Aha niha bû. Belê, bilûr dîsan vejîya. Ez dîvê carina bi-lûrê bî behîv yan jî bi kakilên gwîzan bixemilînîm. Hingê dengê wê çêtîr dibe û tilî li ser wê çêtir digerin.

- Wisan dixuyê, hiin ji bilûra xwe hez dîkin, min got.

- Ehhh... navbera me baş e, jê gazînciyên min tune. Em bî hev dikin. Herweha...

Di wê navberê de dostê min jî got:

- Me vê sîbê bî kêfxweşî dengê bilûra we guhdarî kîr.
- Baş e, kalo gotê, ez jî kêfxweş bûm. Mixabui, ez serê si-
ban nîkarim tu kesî bibînim. Jixwe ez esebî me û îcar serê
siban ez hîn bêtîr esebî dibim. Belê, min dê bîgota... herwe-
ha bilûr ji bo min dibe wasitekê ku ez wan pêlên ku di
hundîrê min de dikelin daxînim, rawestînîm. Dil û mêjiyê
min dî vê payiza emrê min de hê jî pêl didîn. Bilûr ji bo van
pêlan dibe bendek. Hingê ez xwe hinek rehet hîs dikîm.
Bilûra wî pîr xweş bû. Ew, bUiireke zirav û dirêj bû. Ren-
gê wê rengê qehweyi bû û min jê dernedixist ka ew jî kîjan
darî bû. Ew ji nîv mêtreyî dirêjtir û aliyê wê yê jêr hinek fi-
rehtir bû û bi pênc helqan ve hatibû neqişandin. Aliyê jor
(devê wê) jî bi sê helqan her ku diçû firehtir dibû û dî serî
de dîsan ziravtir dibû. Bilûr, ji jêr heta jor, bi heşt helqên
wekhev ve hatibû neqşkirin û di navbera helqan de qul he-
bûn. Di navbera helqa jor ya heştemîn û ew sê helqên jor
yên dêv de navber fuehtir bû, - bî qasî du qatê navbera wan
heşt helqan. Baş dixuya ku bilûr jî destên hostan derketîbû.
Ew, bî wê nazdarî û delalîya xwe, dî hembêza kalo de dibirîqî.
Dî wê gavê de ku min çaya xwe vedixwar, min jî kalo re
37
got:
- Li mala me jî du bilûrên weha xweşik hebûn. Ew yên
kalikê min bûn. Ez bî dengê wan bilûrên nazdar mezin
bûm. Lê, ev bilûra ku di hembêza te de ye, pir cihê ye. Min
heta niha hê bilûreke weha spehî nedîtibû. Ev pîr spehî ye...
- Belê, ev baş e, wî got. Ev bûn çend sal ku em bî hev re
Berî gelek, gelek salan, dostekî min ev bilûr ji bo min
çêkir û ew da mîn. Jî wê rojê pê ve ye ku ez û bilûr, em bi
hev re ne. Em elimîne hevîidu. Ew dibe pardarê tenêbûna
mîn jî û herweha rê li min digire ku ez zêde bîpeyivim. Baş
e, baş.
Rast bû. Ev kalê ha ku çayvexwarîna wîjîli gor xwe bû,

di nav tenêtî, tenêbûneke balkêş de bii. Belê, wî çay jîbi a-
wayê xwe vedixwar; wî pêşî parçeyekî şekîr dixist devê xwe
ii bi dii re jî çay di ser de vedîxwar. Tenêtiya wî ku jî dûr ve
dixuya, tenêtiyeke bi keser bû. Ev çi celeb tenêtî bû? Gelo jî
bilûrê pê ve hûiek tiştên din jî hebûn ku dibûn pardarê
tenêtiya wî?
Lê, hîngê min di xwe de ew cesaret nedît ku ez wê yekê
jê bîpîrsîm. Dî şîina vê yekê de, em li ser bilûra wî peyivîn.
Wî jî bilûra xwe hez dikîr û dixwest her bi bilûra xwe re be.
Jî bo vê yekê jî digel ku wî dil nedikîr - wî ji xwe re
desteke diranên nii dabûn çêkîrin. Bi vî awayî ew li hember
herikandina wext radiwestî.
- Ev yek jî celebeke hezkîrîn e, wî dîgot. Her kes lî gor
xwe jî tiştekî yan jî jî tîştîna hez dike. Hînek jî mal û mîlk,
hinek ji xanîyên xweşik yên baş raxîstî, hinek ji tebîetê, hi-
nek ji çîvîkan, hinek jî hespan û li hespan siwarbûnê, hinek
ji kitêban û dî nav rîipelên kitêban de gerînê, hinek ji se-
gên bêdeng, hînek jî segbûnê û hînek jî ji jinan hez dikîn...
38
Ez jî kêfa xwe ji bUiira xwe re tînîm û dixwazîm her pîşta
wê mist bidim. Ez dixwazim tevî bilûra xwe vegerîm wan
wext, dewr û dewranên ku êdî li pey me mane. Ez dixwazîm
dîsan herîm nik wan, dîsan li wext û tiştên kevn vegerim.
Lî wext, dewr û dewranên kevn vegerin... di nav wextên
kevn de birêveçûn... veger... Ew dengên ku me serê si-
bê lê guhdarî kîrîbûn jî yên dastaneke gelek kevn bûn. Ev
kalê ku bî awakî esebî riya xwe ya hişk dixurand, kî bû?
Gelo ew kîbû?
- Ez têdigîhêm, meriv carina dixwaze here wan dewr û
dewranên kevn, lê meriv divê îro, roja ku em tê de ne jî, ji
bîr neke, dostê min got.
Dostê min ev yek bi awakî pir nerm gotibû da ku kalo
pê neêşe. Jîyan û bûyerên îro ji bo dostê min gelek gîrîng

bûn. Ew bî her awayî di nav bûyeran de bû. Bî dîi cîmla ye-
kemîn re, dostê min dîsan xeberdana xwe domand:
- Em îro di rojên gelek dijwar û çetin de dîjîn. Gelek tîşt
lî herêma me, li doraliyên me û li welatê me diqewimin. Ma
meriv dîvê, qet nebe, ji dûr ve li van tişt û bûyeran nenihê-
re? Ma em dîvê tesîrine lê nekin?
- Ez niha çi bibêjîm? kalo got. Heye ku tu rast dîbêjî. Lê
kalekî weke min nîkare ji bin vî barî rabe. Ez jî bo îro, ji bo
barên îro gelek kal im. Ez hew dîkarim roja ku em tê de ne,
bîjîm û hay li tişt û bûyerên îro hebim. Ez jî eynî weke
destan û stranên me kevnar un. Ez yê do me, ne yê îro. Tu
tekilîya min û îro bi hev re tuneye. Ez divê rastiyê jî bibê-
jim, ev yeka kêfxweşiyek jî dîde mîn... jî lewre dînya ber bî
xîrabîyê diçe...
Me çiiyin dîviya. Mîxabin, em hê dî destpêka rêwîtîyê de
bûn. Nedîbû, ez nedîkaribûm hînek zêdetir li nik vî kalê ku
39
bî tesadufî derketîbii ser riya min, rawestama. û di wê nav-
berê de jî, tiştên ku min bi lez li pey hev gotibûn, alîkarî ne-
kirîbûn ku di navbera min û kalo de dan û standinek peyda
bibe, em ji hevîidu fahm bikin. Herweha tiştên ku min goti-
bûn, bala kalo nekişandibûn.
Her car, her gav weha dibû, meriv diviya her gav tiştekî
bîda ber tiştên din û ew tercîh bikîra. Niha jî wisan bû; çm-
yin yan ji' mayin...
Min çûyin yan mayin dîviya? Min hê
di destpêka rêwîtiya xwe de çûyin dabû ber xwe. Ez rêwî
bûm. Ji lewre min diviya ez niha jî ber bi cîhaneke dîir îi
nenas biçûma. Lê belê, berî ku em dîsan bikevin rê, min bî
hêvîjî kalo pîrsî da ku ez fêr bibîm ka ew kî ye:
- Tiştên ku hîin dibêjin, cimlên we, peyvên ku hiin hil-
dîbijêrin ne li gor van deveran in. Eşkere ye ku hiin ne ji vî
gundî ne, li min biborin, lê min meraq kîr, hiin...

Wî xeberdana min birî, pelekî cixarê danî navbera du tî-
liyên xwe yên zerbiiyî, bi dû re hinek titûn j î raxist ser û bi
dengekîberz got:
- De fermo... havilê xeberdana, havîlê her xeberdanî ev
dîbe! Ha jî te re!.. Hiin dîbînin ka qise çi bi me dîkin, ke-
lime çi tînin serên me, bêje çi xweliyê bi ser me re direşî-
nin? Ax ev kelimeyên malkambax ax, axx... Ev însanan bi
awakî din êdî nîşan didin. Kesê hember jî însanan bi wasita
van keliman dinase. Halê me ne tu hal e, halê me xirab e.
Gotîn û qise lî me hatîne xezebê... Em çawan bîkin, weha
bii, êdî gotin û qîse bûn dar û destên çewt fahmkirin, du-
rûtî û sextekariyê... Naxêr, tiştê ku tu dibêjî, ne rast e. Ew
çewt e. Ez jî vê derê me, ez însanê vê axê me, herwekî gun-
diyên din. Ma tu bî xwe jî nabînî ku ez faniyê vê axê me?
Ma kincên lî ser mîn, bilûra min, sîya vê darê, tîrêjên tava lî
40
ser serê me, ev xaniyê bîçiik nîşan nadîn ku ez însanê van
deveran îm û bi vê yekê kêfxweş im?.. Ez pîr peyîvîm. De
baş e, bila Xwedê bi we re be û riya we vekirî be...
(Te got û te em bî rê kirîn, kalê rind. Bê ku tu dî derheqa
xwe de tu tiştîbibêjî.
Wisan dixuya ku tu têgihîştibiiyî ku ez dê ber bî cîhên
dûr, pîr dîir biçûma. Ez bawer dikim, jî ber vê yekê, gava em
bî rê ketin, te got; «jî reh û rîç, ax û zimanê xwe veme-
qete. Ew, di nav vê jiyana nexweş û neçar de kaniyên kêf
xweşiya me ne.»
Ma ewçend hêsan e ku meriv vê yekê têbigîhê?.. Naxêr, ne
hêsan e, qet ne hêsan e. Ji bo ku meriv bîkarîbe vê yekê têbi-
gihê, meriv divê ji reh û riç, ax û zîmanê xwe veqete, jê bî ,
dûr keve, - yan ji were veqetandin û bidûrxîstîn.
Belê, ev pêwist e. Heta hesret„serî hilnede, heta hesret nebe janeke
bêderman, meriv dê çawan bizanibe ka kanîyên kêfxweşiyê
çî ne? Belê, gîr û girift û rewş û zirîifên zimanê biyanî divên.

Meriv divê van bijî. Dî nav gîr û giriftên zimanê biyanî de xewnên şevên bi jan dîvên. Herweha xewnên şevên dîlkeser dîvê her û her bibin zêde. Zimanê zikmakî divê dî nav wan xewnan de her û her xwe vejîne. Bê ku merîv hay lê be, reqem û hejmar divê bi zimanê zikmakî werîn gotîn. Peyv û qisên zimanê zikmakî, yên ku ji bîr ve bûne, divê ji nû ve werîn vejandin. Çav divê li hêviya name û postê bin. Peyv îi cîmlên ku bi postê tên, dîvê werîn bîhnkirin û xwendîn. Pêşî bîhnkîrin û bi dii re xwendin. Ew peyv û cimle dîvê dî wan şevên bêxew de, jî nû ve werîn bin ronahiya çiran, jî nû ve, ji nû ve, ji nû ve bên ziman û xwendîn. Jan û êş dîvê zêde bîbîn, tenêtî dîvê were jîyîn...

41

Belê, meriv dîvê kêfxweş bibe, meriv divê xemgîr bibe, meriv divê bikene, meriv divê bigrî... meriv divê her tiştîbike, her tiştî bijî, lê nîvî, lê nîvçe, her dem nîvî, her gav kêm, her wext qurmiçî...

Jî bo ku meriv bikaribe hesretê kêmtir bike - naxêr, ne kêmtîrkirin, jî bîr bike - merîv divê zimanên nû fêr bibe, porên jinên nûnaskîn mist bide, bajarên nû bibîne.

Lê hesret divê her carî, her gavî hîn zêdetir bibe û doraliyên meriv vegire. Meriv divê çavên xwe ber bi aliyên dûr - eger roj e, ber bi aliyê royê; eger şev e, ber bi aliyê heyvê - bizîvirîne û xeberên çê bipê da ku ruh, giyan dîsan hînek bîkele, geş bibe. Meriv divê bikeve pey ew reh û riça ku te behs dikirin. Li wan bigere. Meriv dîvê tovên nû biçîne da ku xwe dîsan ragihîne wan dem li dewrên bûrî û kevn. Xerîb... bîyanî... belê, merîv divê bibe xerîbekî, li welatê xerîbiyê bîbe bîyanîkî. Ruh divê derî ji hîsên nû re veke, xwe li wan bîgîre û xerîbiyê, biyanîbûnê bijî... bîjî.

Kalê rind, êdî ez çi bibêjim? Tîştên ku te dîgotîn; reh, riç, ax, ziman... hîngê haya min ji van tiştan tunebû. Ez tênedigihîştîm, min ew fahm nedikirîn. Ma heta merîv bî xwe jî

reh û rîçên xwe bî dîir nekeve, meriv dîkare têbîgîhê ka reh
ii rîç çî ne? Ma heta meriv axên rengîn û erdên têvel pê lê
neke, meriv dikare têbîgîhê çima merîv her tîm dîxwaze di
bin axa bav û kalan de were veşartin? Kêfxweşî û serflrazî...
kêfxweşî û serfîrazîya ruh û giyanê jî her weha ye; ma heta
merîv kêfxweşî û serfîraziyên ku ruh û giyanên dîn weke
pelekê dîhejînin, nenase, meriv dikare kaniyên kêfxweşî û
serfîraziya ruh û giyanê xwe binase?
Eşkere bû ku te hemû ev tîşt nasîbûn û jiyabûn. Ew rehe-
tiya ku jî dengê te yê zirav û tenik berpêş dîbû, helbet, jî van
42
tecrîban dihat.
Niha dema ez van cîmlan dînîvîsim, siya derd û keserekê
jî dikeve ser kaxîzan. Min dîvîya ji te bîpîrsiya ka tu li kîi, lî
kîjan cîh û deveran mabûyî, te çî dîtîbûn, çi hatibûn serê te,
te çi hîs kiribûn. min diviya - heta tu bîwestîyayî - ev
tîşt car bî car ji te bîpirsîyana...
Gava em jî te veqetîyan, te jî me re got, «de bi xêr û xweşî herîn.»
De tu ji niha bî xêr û xweşî here kalê rînd, bî xêr û xweşî...)
Me kalo û bilûra wî lî wê derê, dî bîn sîya darê de bî tenê
hiştin û em ber bî aliyê bakur ku ez dê bîçûma, bî rê ketin.
Piştî ku şîvan û dostê min li bajêr ji min veqetîyan, ez bî te-
na serê xwe ber bî alîyê welatê bakur û bajarê Stockholmê
bi rê ketim. Ez dê bîçûma Stockholma ku stêrika bakur bû ii
lî ser giravên têvel û biçûk dans dikir. Stockholma ku dê bû-
bûya warê min yê sîrgûniyê...
2
Kalê rind, tu dîzanî, gava ez gihîştim Stockholmê, min çi kîr?
Mîn hisên xwe yên nexuyayî, tevî gula xwe ya sor, danî
ser diwarê salona mala ku ez tê de rûniştîm. Belê, min gula
xwe ya ku di rêwîtiya min de her bi min re bû, danî koşa
herî baş ya salonê. Gula min ku êdî hişk dibû, dê niha ji wê
derê li min binihêriya. Wê dê her û her li min binîhêriya û

ew wext, dewr û mekanên ku êdî min li pey xwe hîştibûn, bianiya bîra min û ew hisên ku ji min bi dûr diketîn, dîsan li mîn vegerandina. Naxêr, ne weha... Ev, ev hemû; wext, dewr û mekanên ku min li pey xwe hîştibûn û hîsên min dê bi hev re bibûna yek, li dor gula sor biciviyana û bûbûna pelên wê. Keser û hêviyên ku li ser pelên hişkbûyî yên gulê veniş-tîbûn, dê ji wê koşê ji min re dest hêl bîkirina.

Lê bi dîi re, di welatê xwe yê nû de ku bûbû warê sîrgii-nîya min, min gulên nû dîtin. Min di wê payîza bî keser de ew gulên ku êdî diçumîsîn, deste bî deste wergirtin û anîn malê. Min ew xistin nav feraqan û li wan nihêrîn. Ji bo ku ez bikaribîm welatê xwe yê nû bînasim, min ji wan alîkarî xwest.

44

Herweha min di nav mij û dûmanên payizê de pelên ren-gîn jî dîtin. Ez daketim nav daristanan. Min di bin barana sivik ya pelên rengîn de ew awayê nîi, bîhna nû kişand hun-dîrê xwe. Car bi car. Heta bîhn li min biçîke...

Dema çavên min di nîvên şevan de ber bi gula ku li dîwêr hilawistî bû, zivîrîn, ez daketim kuçe û kolanan. Ez bûm he-valê stêrîkan. Min bêdengiya şevên çiksayî daqultand.

Mîn lî welatê xwe yê nû malên, xaniyên spi û fîreh dîtîn. Mal û xaniyên pir spehî û kevn ku ne yên roja me bûn. Ma-lên ku bi kolanên teng û biçûk lihevhatî bûn. Xanîyên ku tê-kûz bûn... Ew malên spehî û kevn her tenêtî û xerîbiya mîn dîxistîn bîra min... Ez di bin siya van malan re derbaz bûm û meşiyam. Min li wê derê, di nav kolanan de, li ber deriyên malan gelek tişt keşf kirin. Min bi heyecaneke xurt, car bi car, kolanên teng, nizm û tarî; derencên ku dixwestîn xwe ragihînin asmanan; hewşên malan û di nav hewşan de bex-çên biçûk û xweşik û di bexçan de jî bîrên kiir keşf kirin.

Min her car tiştekî nii keşf kir. Ez di wan bexçên navmalan û veşartî de bi saetan rûniştim û ber bi axên xwe, ber bi axên bav û kalan bi firê ketim. Weke ku ez dê tiştekî nû bibînim, wîsan bi hêvî,

ez hilkişiyam ser wan derencan. Ez li ser wan bankên biçûk ku di kolanên teng û biçûk de hatibûn danîn, rûniştim û min çarînên Hêvî-Hesret û Azadiyê nivîsîn.
Ez li ser devên wan bîrên kevn rûniştim. Kevîrên devê bîran dî rengê yaqûtî de bûn û mij ji wan radibû. Mîn bi saetan li kevirên bîran nihêrîn. Min bî heyret dît ka çawan ew mîj û xwîdana kevîran dibûn dilop, çawan ew dilop hêdî hêdî dev ji keviran berdîdan, çawan wan xwe berdidan avê û çawan wan li ser rûyê avê helqena pêk dîanîn... Lî wê derê ez li ber tiştekî ketim; helqe, ew helqên
45
ser avê ku dîxwestîn her û her fueh bîbîn, di kêhkê de wînda dibûn û dimirîn.
Ez li wê derê fîkirîm; çima ev helqe heta bi heta fireh nedîbûn, ew nedîkarîbûn fîreh bibîn, çima bî keviran dor lî wan hatîbû gîrtin? Mîn bî çavên xwe, hîs û fikrên xwe li ser wan kevirên kevn yên kolanan ku dîbirîqîn, nivîsîn. Ew kevîrên ku evîndarên siya malan bûn, weke kevirên hîir û lihevhatî yên zaroktiya min bûn. Min ev jî eynî weke kevîrên zaroktiya xwe mîst dan û lê nîhêrîn. Min lî wan cîhên ku kevîr û hîmên xanîyan bi hev re yek dîbûn, kîtabdarên kal nasîn. Ez li nik wan rûnîştim, min li nik wan qahwe vexwar û li kîtêbên ku doraliyê min girtibûn, nîhêrîn. min li wê derê kitêbên pir spehî ku bi zimanên bîyanî hatibûn nivîsîn, dîtin. Digel vê hindê ku min ew ziman nedîzanîbûn, min çendine ji wan kîtêbên spehî kirîn û anîn malê. Min dî bîn gula xwe ya sor de refeke xweşîk çêkir û kîtêb danîn ser. Gava min kîtêb danîn ser refê, ez dîsan xemgîr bûm. Hingê, gava min li kitêban nihêrîn, min pir xwest, belê, min pir xwest ku bila kîtêbeke pir kevn ku bi zimanê min hatibû nîvîsîn, jî li ba wan kitêban hebûya. Ew jî bûbûya pardarê xerîbîya min.
Min deriyên hesinî yên wan xaniyên spi û fireh vekirin ii daketîm hewşên wan. Hewş di rengê payizê de bûn. Hingê

min xwe pir xerîb, pir neçar û pir bêkes his kir û bi van hi-
sên weha tîjî, ez li hewşên malan rîinîştim. min xwest, mîn
dil kîr ku bila ev hewş bişibin hewşa mala me ya eşîrî, bi-
la bîbin weke wê. Lê, nedibû... nedibû. Dî nav bêdengîya
hewşan de - nîzanim çÛTia - ez li ser valahî, bêdawîtî, yanê
bê ser û berî ii... mirînê fikîrîm. Wê gavê min hinekî dîn jîjî
liberxwedan, hêvî û jiyanê hez kîr. min şiîrên ku hêvî dîdan
46
merivan, xwendin.
Herweha di nav dostiya bêdeng ya hewşan de mînjîyana
xwe ya nû hembêz kir. Min çend dilop ji jîyana nii ku dê bî
heyecanên nîi, hêviyên nû, tenêtiyên nû, evînên nîi, janên
nîi ve tijî bûya, vexwarin. Min lî asmên û dîwarên hewşan
nihêrîn û ez bi çend dengan qîriyam: «Heyecan, tu bî xêr
hatî. Derd û keser, hîin bî xêr hatîn. Jîyana nîi, tu bî xêr ha-
tî. Hêvî, hêvî, hêvî... tu bi xêr hatî.»
Hewşên wan malên kevn bi rengê zîvîn dibîrîqîn.
Min di destpêka êvaran de li wan hewşan jin jî nasîn. Jî-
nên dirêj, porzer. Jinên xwedî çavên zerya. Rîi, beden û çer-
mên wan di destpêka wan êvaran de dibiriqîn. Ez bi wan re
bûm heval. Min li wan guhdarî kir. Min xwest ku ez wan
fahm bikim, têbîgihêm. Gava tiliyên wan yên dirêj li ser pî-
yanoyê geriyan, min nêzîkî li wan kirin û li tilîyên wan ni-
hêrîn. Min serê xwe danî ser cogên wan da ku ew tilîyên
dirêj di nav porê min de bigerin. Min lêvên wan yên bi goşt
ramîisîn û hêtên wan yên fireh mist dan. Ez bûm pardarê
kêfxweşiya ku di ew çavên zelal de dixuyan û min ew çav jî
ramûsîn. Ez bi wan re bêdengîyeke ku ji pêtên êgir hatibû
pê, jiyam.
û tu dizanî, min wekî dîn çi kir? Her çîqas ew tênegîhên
jî, min ji wan re behsa te kir. Min ji wan re got; «mîn li ser
riya xwe kalekî rîspî û ecêb dît. Ez gelek meraq dikîm ka
ew çi kes bii.»

Belê, kalê rînd, min ev yek jî gotin...)
Ez hatim Stockholmê û min dest bi jiyana xwe ya nû kir. Jiyana nii ya sirgûniyê... Ev jiyana nii hem bî zehmetî û hem jî bî tîştên nû ve tijî bûn. Lê ev zehmetî û tiştên nû nebûn
47
asteng ku ez kalo ji bîr bikim. Lî bervajîyê, - bî tesîra cîvat, kultur, edebîyad û zîmanekî nû jî - kalo di heşê min de bû tabloke ku ji rengên têvel hatibû pê. Min dî welatê xerîbîyê de dest pê kîr û bî vê tabloya rengîn jîyam. Lê mozaîka rengan ne temam bû, hînek rengên tabloyê kêm bûn. Ew jî-yana kalo ya bî sir û esrar bî pirsan ve tîjî bû. Herweha ew tenêtîya wî ya ecêb jî. Kalo ji dewr û dewranên rabîrdû hez dikirin, lê ya rabîrdiiya wî bî xwe?.. Rabîrdîiya wîbi xwe li pey mîj û dûmanan bû. Tiştên ku bi zehmetî jî devên wî derdiketîn, perda mîj û dûmanê hînek radikir. Lê belê, bî tenê hewqas; hinek...
Ev kalê kor, kalekî din ku pê re dan û standina min hebii, dîanî bîra mîn: Nivîskarê kal û kor yê Arjantînî Jorge Luis Borges. J.L.Borges yek ji wan nivîskaran bû ku min bi kêfxweşî dixwend. Sê alîyên kalê kor û nivîskarê kor mîna hev bûn; kal, kor û evîndarê rabirdû û dewr, dewran û mekanên kevn bûn. Borges di kurte-çîroka xwe «Borges û Ez» de digot; «ez ji saetên qûmê, xarîte, weşanên sedsala hijdan, tahma qahwe û pexşanên Stevenson hez dikim.» Yanê ji dewr û dewranên rabîrdû re evîn, rêz û rêzdarî... Borges di eynî kurte-çîroka xwe de nivîskar Borges û Borgesê ku di jîyana rojane de dîkeniya, digîriya, hîs dikir, difîkîrî, dipeyivî, dida ber hev û behsa dijîtî û berberiyên kesekî xwedan duşexsiyet dikir.
Min wisan hîs dikir ku kalo jî xwedî şexsîyetekî weha bû. Yanê lî pey şexsiyetê ku dixuya, şexsiyetekî wî yê veşartî jî hebû. Lê şexsîyetekî çawan? Kalemêrê ku li sirgûnê, lî wela-tê xerîbîyê jî bi min re bû, dî heşê min de bû, çi vedişart? Li

pey qîsên wî yên balkêş çî hebûn?
Min, li welatê xerîbîyê, bî qasî du salan, her ev pirs ji xwe pirsîn.
48
Belê, min kalo, piştî du salan, ji nû ve dît.
Dema ez dîsan çûm deverên kalo, - bê guman - tiştê ye-
kemîn ku min kir, ev bû; min xwest, ez bizanîbîm ka kalo
dijiya. Belê, kalo sax bû. Ez bi ve yekê kêfxweş bûm û hema
di cîh de, min karên xwe yên dîn berdan alîkî û ez ber bi
gundê kalo, bi rê ketim. Zivistan bû û baran pir barîbû. Ji
ber vê yekê, gelek dijwar bû ku meriv xwe bîgîhanda gund.
Baranê rê bi axê ve kkibû yek. Meriv ne bi erebê û ne jî pe-
yatî dikaribû biçûya gund. Lê gundiyekî hate hawara min.
Mîn li wî bajarê ku nêzîkî gund bû, ji xwe re hevalekî peyda
kir. Ew dê jî biçûya gund. Lê ji me re du bergîr diviyan.
Peydakirin û kirêkirîna bergîran pir wextê me girt. Lê di
dawîya dawîn de, me ew peyda kirin û em bi rê ketin.
Eger jî gundiyê nik min nebûya, ez dê tu carî negihîştîma
gund. Rê nemabû. Ax heta cogan bûbû celb û baran bê ra-
westan dibarî. Me bi hezar zor û zehmetî, ber bi êvare, xwe
gihand soind.
Gund di wê roja sar û şilope ya zivistane de, ji her cari be-
tir bi keser û terkkirî dixuya. Gund û doraliyê wî mirîbû û
ew dara ku em li bin rûniştibûn, niha rût û serqot bû. Dar û
şax Û çiqilên dare pelweşiyayî bÛn û ve yeke rebeniya gund
hîn zêdetir dikir. Tu kes li der û dora gund nedixuya. Lê jî
hînek banên gund dûman radibû. Bî tene ve yeke nîşan dida
ku gund hê jî jîndar e, ew hê jî dijî.
Em rast bi rast ber bi aliye dare çûn. Min xwest ku ez peşî
herim mala şîven, pê re bîpeyivim, jê hînek agahdarî wergi-
rîm û bî dû re jî - tevî şîven - herîm ba kalo. Lê şîvan ne li
mal bû. Derîyê wî vekîrî bû, le dî oda tarî de tu kes tunebû.
Jî oda kalo deng dihatîn. Ez bî ve yeke kefxweş bûm. Wisan
dixuya ku kalo - herçî zîvîstan, sar û pîik bû jî - sax bû û li

49
nik wî kesîne hebûn.
Min jî gundîyê ku heta wê derê bî min re hatîbû, re spas kir û jê re got :
- Jî dengan dîxuye ku kalo lî mal e, jixwe ez jî hatîbûm ku wî bîbînîm. Fermo, were em bî hev re herin hundir.
Gundî spas kir ûi bergîrê min jî da ber xwe û ber bi koma xaniyan çû. Ez jî ber bi aliyê xanîyê kalo çûm. Ez bîskekê lî ber derîyê kalo rawestîyam, min xwe da hev û tîştên ku mîn dê bîgotîna, dan ber hev. Bi dîi re, min li derî xîst û heta dengekî jî hundir got «fermo», ez li ber derî rawestîyam. Gava ez ketkn hundîr, min dît ku şîvan jî lî wê derê, lî nik kalo rûniştiye. Kalo, şivan û du gundiyên ku min qet nedî-tibûn, li koşê, li doraliyê manqalekê rûniştibûn. Hemîiyan jî bi awakî şaşbûyî li min dînîhêrî. Şivan gelek şaş bûbû. Min îi şîvên bi ken hevûdu hembêz kir. Min destê kalo û yên gundiyan jî guvaştîn û ez li nik wan rûniştim. min hê fersend nedîtîbû ku ez devê xwe vekîm, şivên dest pê kir û got:
Tu û ev der!.. Çi bii, çi qewîmî, tu çima dî vî sar û sermayê de hatî û tu çawan hatî?
Mîn jî, hêdî hêdî, jê re got:
- Helbet,.. meriv bi hêsani nikare were gundê we. Hûn û tebîet, bi hev re bûne yek û dixebîtin da ku tu benî adem Hngê xwe navêje van deran... Gundiyekî alîkarîya min kir, Xwedê jê razî be. Eger ji wî nebûya ez nîkarîbûm bihatima. Sedemekî wîsan gîrîng yê hatina min tuneye. Hinek karê min hebû. Piştî ku min karê xwe bî cîh anî, min dîl kir ku ez we jî bibînim...
Mîn lî wê derê negot ku min dixwest - nemaze - kalo bidî-

1. Di wê navberê de, kalo got:

- Belê, belê, min tu nas kirî, min tu ji dengê te nas kirî.
50
Tu dîvê Serdar bî, ew xortê înadkar bî, xortê ku dîbin darê

de dîxwest tîştîna bîpirse. Lê wîsan dîxuye, tu ne bî tenê î-
nadkar î, herweha sergerm î jî. Herwekîdostê xwe. Malava,
ma însan dî vê pîik û şiliyê de tê van deran?
- Weke dîn çare tunebû, min gotê. Ez neçar û bêgav mam.
Eger ez niha nehatîma, ez dîviya saleke dîn jî li benda hatînê
bimama. Yane, piştî saleke min keys hebû ku ez bîhatîma.
Kesên odê he jî şaş bûn. Em bî qasî bîskekê bêdeng man
û me bêdeng, lê bî ken, li hev nîhêrîn û em kenîyan. Paşê,
kalo pîrsî:
- Rast, hal û hewalê dostê te çi ye, ew dî çi halî de ye? Ev
bû demeke direj ku ew ber bî alîyên me nayê. Ew niha li kû ye?
Ji mêj ve bû ku min ji jî dostê xwe tu xeber wernegirtibû.
Ew li welêt bû. Lî welêt jî rewş her ku dîçû xirabtir dîbû.
Welat bi her awayî tev li hev bûbû, alozî û geremolên sîyasî
û aborî li pey hev dihatîn û her roj gelek meriv dihatîn kuş-
tin. min jî dostê xwe gelek meraq dikir û ez ditirsiyam ku
tîştekî bî serê wî de were.
- De baş e, çima ew jî welêt dernakeve hingê? kalo pîrsî.
- Ez nizanim, min got. min çend car je re nivîsî. Le ez ba-
wer dîkim ku ew naxwaze terka welet bîke. Ew dbcwaze li
wê derê bimîne û ji bo guhertina bûyeran bixebîte, wezîfe û
erka xwe bi cîh bîne.
Kalo dî bîn ronahîya qels ya çira bî gaz de, niha hîn kaltir
Û hîn westîyayî dixuya. Rîyê wî, dîsan, direj bÛbû. CUenH
ser niha hîn zexm û germtir bûn.
Oda kalo jî ya şîvên biçûktir bû û weke oda şîvên hatîbû
raxîstîn, - eger merîv bîkaribûya je re bîgota raxistîn. Le bî
51
tenê ferqekî hebû; di oda kalo de, lî koşa herî jêr ya odê
tîştekî weke qenepek hebû. Ew cîh, herhal, cîhê nîvînê bû.
Li nik qenepê jî sandûqeke hûr hebû. Sandîiq textîn bû. Li
Tenişta derî, li derekî ban dîlop dîkir.
Feraqekî naylon hatîbû danîn da ku dîlop neçîlkin. Şîpe şipa

dilopan dîbûn şîrîkên dengên me. Dî navenda cîhê ku em lê rûniştibûn de manqalek hebû. Çend lib komk hêdî hêdî lî ser manqalê dîçîrûsîn. Li ser dîwarê ku tam li hember min bû, tîştekî weke tabloyekê dixuya. Lî ser tabloyê bi tîpên erebî tîştine ku weke rêzên şiîran bûn, hatibûn nivîsîn. Tablo spehîbû.
Ez niha hatibûm oda kalo jî. Gelo min niha hîn bêtir nê-zîkî lê kirîbii? Ma min niha gaveke dinjî nêzîkî li ew sûrên ku kalo li doraliyê xwe anîbûn pê, kiribûn?..
Dengê şîvên rê lî min gîrt ku ez pirsên serê xwe zêdetir bikim. Şivan ew welatê bakîir û cîhen ku ez jê dihatim,dîpk-sîn. Min jî bî kurtebkî jê re behsa ew cîhên ku ez jê dîha-tim, jiyana wê derê, dan û standînên wê derê, merivên zerîk, maxazên mezin, leyîstokên biçûk, roja ku nedixuya û dema ew dixuya nediçii ava, xwarin û şîvên wan, evîn û evîndari-ya kulîlk, dar û ber, pîsîng û segan kîrîn.
Bî her awayî dîxuya ku kesên lî odê bi meraq lî mîn guhdarî dîkkin.
Tiştên ku di derheqê cîhaneke pir dûr û
nenas de dihatin gotin, bala wan dîkişand. Lê, meriv nedi-karibû ev yek jî bo kalo jî bîgota. Wî, di destan de pelê cixarê û tîtîin, bêdeng cixare dîpêçand. Merîv nedikaribû di rûyê wî de nîşana tu guhertînê bidîta. Rûyê wî tu tîşt îfade nedîkk. Ne kêfxweşî, ne derd û xem, ne keser...
- Tu çi dîbêjî? Ma em jî herîn welatê bakûr û lî wê derê cîwar bîbîn û li wê derê bîbin kulîlkek? Ha? Belkî hîngê hînek dê bîbînîn ku em jî hene, em jî dîjîn û lî dinê ne.
52
Şîvên bi ken ji kalo dîpirsî. Kalo jî - ken li ser rîi - lê vege-rand:
- Belê, çima na? Helbet, li wî welatê dîir jî jiyan heye îi însan dikare li wê derê weke kulîlkekê jî bijî. Belê, însan dî-kare wîsan jî bijî... Lê belê, ez bawer nakim ku jiyana wê derê gelek çêtir e. Insan her gav gazîncî lî tiştên der û dora

xwe dîkin û tiştên ku ji însên dûr in, her gav xweş û balkêş
Lê, însan divê ji bîr neke ku li her derî gîr û gkîftên jî-
yanê hene. Ez bawer dikim ku hinek zehmetî û dijwarî niha
îlam li dor kulîlkên welatê bakiir jî hene. Mixabin, em hê
hîn nebûne bê gîr û gkifdarî bijîn... herweha, ax û welatên
xerîb çiqas baş û xweş dibîn bila bibîn, însan nîkare her H
wan deran bîmîne û bihewe. Insan nikare rehên xwe berde
bîn axên xerîb... Ma ne çêtir e ku tu welatê bakîir jibakiiri-
yan re bihêlî û qîma xwe bi kêfxweşîyên welatê xwe bînî?
Li welatê me jîkêfxweşîhene. Lê însan divê lê bigere. Rast,
tu dê jî bo mêvanê me çay daneyînî ser êgir?
Gava kalo behsa çayê kk, hîngê hat bîra min ku ez birçî
bûm. Min jî serê sibê vk ve tu tişt nexistîbii gewTÎya xwe.
Li wê derê, min negot ku ez birçî bûm. Di wê navberê de, ez
bi gundiyan re peyivîm. Bedena min niha hinek germ bûbû.
Min ji gundiyan rewşa gund û zivistana bi şilope pirsî. Wan jî
- her bî ken - bersîva min da. Li gor ku wan digot, zîvîstan
zû hatibû û ew pir dijwar bii. Wan nedikaribûn pez û dewa-
rên xwe derxîstîna der û kadînên wan vala dîbûn û wan ne-
dîzanîbûn ka ew dê çi bikin. Tîştên ku wan behs dikkîn, ne
tîştên xweş bûn. Merîv pê bîhnteng dibû û ez bawer dikim
ev tişt dîviya jî bo wan jî meselên mezîn bûna. Lê dîgel vê
hkidê, wan bî rehetî û bî ken behsa neçarî û belengazîya
xwe dikir. Min bî meraq jî wan pirsî:
53
- Baş e, halê we dê çawan bîbe? Wisan dixuye ku baran dê
zû bî zîi raneweste. Hîin çi difîkkin, hîin dê çi bîkîn?
Gundîyê ku lî nik min rûnîştîbû, bî eynî ken û rehetîyê
bersîva min da:
Em nizanîn... Xwedê dê helbet, bî awakî, rîzqê me
bişîne. Xwedê heye, xem tuneye.
Min wext dîvîya ku ez têbîgîhîştînia ka gundî bî çî awayî
dîfîkkîn. Ew niha dîsan dikenîyan, lê wan dil tunebû ku jî

mîn re bidana zanîn ka Xwedê dê çawan rizqê wan bîşanda. Kalo hê jî cixare dîpêçandîn. Cîxaran tîştekî anîbîra min. Ez jî cîhê xwe rabûm û ber bî aliyê derî çûm. Gava ez dê ji derî derketîma, şivên jî min pirsî:
- Kû da? Tu ber bî kîi derî?
- Ez dê heta oda te herim, min got. Min tiştên xwe lî oda te berdan. Ez dê hema herîm û dî hîlmekê de vegerim.
Ez çûm oda şîvên û ew du hesteyên ku min ji bo wan kî-rîbûn, ji çanta xwe deranîn û ez dîsan bi şiin de vegeriyam. Min lî welatê xerîbiyê jî bo kalo û şîvên du hesteyên bîçûk û spehî kkîbûn. min ew dan kalo û şivên, bî hêvîya ku ew pê kêfxweş bîbin. Şivên hema kêfxweşiya xwe nîşan da û destê xwe avêt ser mîlê mîn. Lê fahm nedibû ka kalo jî pê kêf-xweş bûbû yan na. Wî heste wergkt û bî dîi re got:
- Himmm, wisan dixuye, te, ji mêj ve, dîl hebûye ku tu werî gund...
Te çima ev zehmetî xwar û ev tişt ji me re anm?.. Tu sax bi. Li ser rîiyê kalo tu kêfxweşî nedîxuya, lê kalo îcar - jî ca-ra pêşîn ku min ew dîtibû - hîn rehettk dîxuya. Hîn bêtk westîyayî, lê hîn rehettîr. Min vê yekê jê re got.
- Belê, ez niha çêtir û rehettk îm, wî got. Eger dîlopên vê banê jî nebûna, ez dê hîn çêtir bûma. Lî vê derê jî bo rehe-
54
tî her tişt heye. Jiyan li vê derê di bin poşikeke nerm û stûr de lal û bêdeng nivistî ye. Ev der bêdeng e, ne pejîn, ne teq, ne req. Doraliyê me lal û xamûş e. Icar wext... ji xwe wext li vê derê naherike û tîştên ku wext tînin bîra însên, li gundê me windabûyî ne. Em di nav wextên mirî de dijîn. Yanê wext lî vê derê mirî ye. Em jî... leheng û şerwanên wexta mirî ne... herweha, êdî ez li hêviya melayîka mirînê, ruhistîn im jî. Ez li benda wî me da ku ew were û bîkeve hembêza min. Lê ew nayê. Ez nizanim ka ew jî min qaherî ye yan keys bî dest naxîne? Belê, rehetîya min aha reheti-

yeke weha ye. Rehetîyeke bêdeng, rehetîyek di nav wextên mirî de.
Wî bi hesteyê xwe dilîst. Heste di nav destên wî de dîçû û dihat. Meriv dikaribû ji vê yekê derxista ku kêfa wî jî hestê re hatibû. Yan ji bervajiyê vê yekê, tewr haya wîjî hestê tunebii. Belê, heste dî destên wî de dîçû û dihat, lê heşê wî li derekî dîn bii. Ew, heste di destan de, bîskekê bêdeng ma û pîşt re jî şivên re got:
- Hele ji bo xêra dê û bavê xwe, van cixarên hanê dayîne ser manqalê, dayîne ser koşeke manqalê.
Bi dû re jî, wekî ku ji nişkekê ve hatibe bîra wî, wî jî mîn pirsî:
- Rast, ma tu ne birçî yî?
Ez birçî bûm. Ez weke gurekî birçî bûm.
Ew niha li ber xwe ketibûn ku gava ez hatim, wan jî min nepirsîbûn ka ez birçî bûm. Gundî ji kalo û şivên zêdetir lî ber xwe ketibûn. Wan bi giramî li min dmihêrî û her dîgotm «li me bîbore, li me bîbore.» Ez şaş mabûm. Bî bawerîya min ev tîştê ha ne ewçend girîng bû. Wan hay jê nebû ku ez dê dî wê baran û piikê de bihatima û min dê li deriyê wan
55
bixista. Ew - gelek tebî - şaş mabûn û di wê şaşbûnê de wan ji bîr kirîbû ku ji min bipirsin ka ez birçî bûm. Min bi xwe jî dî nav xeberdana germ de ev yek jî bîr kiribû. Gava min vê yekê jî wan re got, gundîyan hema dengê xwe bîlind kk. Gundiyê nik min dîsan bi dengekî kesertijî got:
- Malneşewitiyo!.. ma qet weha dibe? Ma meriv mêvanê Xwedê naezimîne? Tu dî vê celb û şîlopê de heta vê derê têyî, lê em bîr nabin ku jî te bipirsin ka tu birçî yî yan jî na. Ma weha dibe?
Piştî ku wî xeberdana xwe qedand, ew û şivan bi hev re ji odê derketin.
Ez şermezar biibûm. Bi bawerîya min ne hewce bû ku

meriv li ser tiştekî weha hûr - bî vî awayî - qîre qîr bîkira. Bîhna min jî teng bûbû. Lê belê, wisan dîxuya ku kalo bi vê yekê kêfxweş bûbû. Ji lewre ew dikeniya. Ew ji alîkî dikeniya û ji alîkî jî cixare dikişand û çay vedixwar. Baş dixuya ku kêfa wî ji cîxarê re dihat. Wî bi best cixare dikîşand. Ez nizanim ka wî ji bo çi hewce dît, lê wî dî wê navberê de xwest li ser cîxarên xwe bipeyive:

- Heye ku tu niha meraq dikî ka ez çima cixaran datînîm ser manqalê? Wan hîşkbûyîn divê... însan divê tkûna pêçandî hişk bike. Hingê ew tkûn, tkîina li ser êgk hişkbûyî, rehettk û xweştk tê kişandin. Dema titûn tê birîn û hûrkirin, hîngê însan pir av didiyê. Tîtûna avdayîgkan e. Ez nikarim tîtiina avdayi zû bî zii bikişînim. Ez pê dikuxim û serê mîn pê diêşe.

Min di derbarê titûn û kişandina wê de tu tişt nedizanîbû, lê jî bo ku ez jî bersîvek bidimê, min lê vegerand:

- Cîxarên pakêtkkî hene. Ma hîin çima cixarên pakêtkirî nakîşînîn? Ez bî xwe cixare nakîşînim, lê ez bawer nakîm ku

56

kişandîna cixarên pakêtkirîjî ewçend xirab be.

- Kêfa min hew jî wan cixaran re tê, wî got. Ez nîkarim wan bîkişînîm. Min dî salên bîhurî de ew celeb cîxare dikişandin. Lê ji mêj ve ye ku min dev ji wan berdane. Titûna wan ne baş e. Heta ez dîkarîm bîbêjim ku ji tîtûnê pê ve her tişt di nav wan de heye. Meselek dîn jî heye; însan dîvê dakave bajêr da ku wan peyda bîke. Ez bi xwe nikarîm dakevîm bajêr û ez naxwazim jî kesên din jî tîka bîkim. Eger însan vê titûnê, yanê titûna pêçandî bikişîne, derdên weha jî jî holê radibîn. Gelek qaçaxçî ji gundê me derbas dibin û gava ew derbas dibin, hinek titûn jî ji min re berdîdîn. Herweha, ev tîtiin titûneke pir xweş e jî. Insan nikare titûneke weha xweş lî derekî dîn yê dkiê bîbîne.

Wî bî kêf behsa cixarên xwe dikir. Meriv dikaribû niha

siya kêfxweşiyê jî li ser rîiyê wî yê qermiçî bîdîta. Ev sî, ya kîjan kêfxweşiyê bû? Ew awkê ku ji vî riiyê kal dîxuya, çî bû? min dê çawan nêzîkî li wi a'wirê bîkka?
Ez hê weha difikkîm, kalo ji min pksî ka ez li gundan, lî ba gundiyan mabûm yan na.
- Naxêr, min gotê. Bi dîi re jî min gotina xwe rast kk; gelek kêm. Ez gelek kêm li gundan û li nik gundiyan mame.
- Gundî... yanê em... em însanên rehet in, wî got. Em dî nav tebîetê de ne, tekilîya me bi tebîetê re pir xurt e. Heye ku ji ber vê yekê be, em li gor daxwaziya dîlê xwe radibîn ii riidînîn. Em her tîştî; rindî, xirabî, dostî, dijminî, evîn û evîndarîyê... her tîştî lî gor ku em hîn bûne, lî gor ku em pê dîzanîn, dîbêjîn, dijîn û li ser dipeyivîn. Pîvanên me jî li gor me ne. Ez nabêjim ku yên me jî yên komik û cîvatên din çêtir yan jî xîrabtk în. Lê pîvanên me li gor me û cîvata me ne ii em li gor wan radîbîn û rûdinin. Mêvanbûn, mêvanezî-
57
mandîn, xwedanmêvanî ji bo me tîştên pir û pir muhîm in. Em gelek ehimîyet didki vê tiştê. Tu dizanî... lî ser vê yekê gelek stran û dastanên me jî hene. Ew stran û dastanên ku behsa mîr û serekeşîrên mêvanperwer dîkin. Mîr û serekeşîr - jî bo ku mêvanên xwe nedîn destê dijmîn - xwe dîdin kuştîn...
Xeberdana kalo stran û destan anîn bîra min. Ev yeka, yek ji wan sedeman bû ku ez lî wê derê bûm. Xeberdana kalo dîsan weke her carîbalkêşbû. Lê, min xeberdana wî bkî ii jê re got:
- Lî min bîbore... behsa stran û destanan bii... Ez jî dîxwazîm ev stran, destan û çîrokên kevn berhev bikim. Ez bawer dîkim ku ev yeka jî bo me, jî bo nîfşên nii erkeke esasî
1. Eger hîin bikaribin alîkarîya min bikin, ez dîxwazîm vê wezîfa xwe bi cîh bînim.
Ew heykî mabii. Wî got:

- Tîştên kevn... belê, wîsan dixuye ku best lî tiştên kevn rabûye... na, na, ne xkab e.
Paşê jî ew bîskekê kenîya û serê xwe hêjand û dîsan got:
- Ew tiştên ku tu behs dikî, ewçend pir in ku xebateke weha dîkare çend umk kuta bîke. Ez bawer nakim ku tu bi-karibîbi ser kevî.
- Mebesa min ne xebateke wîsan pir mezîn, fu-eh û kîir e. Jîxwe ez vê yekê nîkarim bibîm serî, ez nikarim ji bîn bare-kî weha rabim. Ez dîxwazim, bi qasî ku hêz û teqeta mîn dest bide, vê xebatê bikim. Eger meriv bîkaribe gavek jîber bi pêş bavêje, dîsan baş e. Ez bî xwe dê pê kêfxweş bîbîm.
- De baş e, wî got. min bi tenê xwest ku tu hay lê bî ka çî dîjwarî lî ber te ne... Dema hîin, tu û dostê te, cara pêşîn lî vê derê bûn, min jî xeberdana te fahm kir ku tu însanekî
58
înadkar î. Ji bo înadkarîyê, tu dîvê ji min tu alîkarî nepêyî. Ji lewre, tiştê ku ez bikaribîm bikîm yan jî bidim tune. Di vê warê de tu bi qîma xwe yî. Lê li ser stran, dastan û çîrokan tiştên ku em bîkarîbin bi hev re bîkin hene. Ez dê alîkarîya te bîkim. Madem tu di vê qiyametê de heta vê derê hatî, me divê ku em alîkariya te bikin. Ji destê me çi were, em dê bikin...
(Te alîkariya min kk, kalê rind, te alîkarîya min kk. Te ez avêtîm nav wê cîhana bi xêr û bereket ya peyv û qîsên germ û rengîn.
Peyvên germ weke pêtên agkê manqalê dîlê min, mêjiyê min kizkandin. Peyvên rengîn ji nû ve vejiyan, bûn jîndar û hatin nik min.
Ez bi peyvên xwe yên nas û nii li peyvên te yên kevn û efsanewî fikkîm û lî ser
wan peyivîm. Min dîlê xwe jî wan peyvên kcvn - lê jî bo min nii - re vekk. Belê, min dîlê xwe da ber germîya wan...
Te zîmanê min, ew zimanê min yê dîlsoj û keserkîir da min...

Belê, min zimanê xwe, heyîna xwe ya herî miqades, herî mezin ji nû ve keşf kir. Ez fêr bûm ku meriv dikare peyvan bi awakî din jî bi kar bîne, bi awakî din jî wan bîne zi-mên. Min dît ku meriv di bin perda gkan ya tenêtîyê de dî-kare bi peyvan re hevaltiyeke kîir û besttijî bîne pê. Belê, min dîlê xwe bi peyvên te yên kevn û efsanewî neqîşand. Min ew peyv weke libên mirwar û lîilîiyan di hucrên herî hiir yên mêjiyê xwe de rêz kkîn.

Ma ew şev tê bîra te? Şeva ku gundî jî li nik me bûn û me bi hev re mewîj û kakilên giizan dixwarin? Wê şevê, min dî bin ronahiya mirî û qels ya çkê de roja sor û germ dît. Belê, min roja germ û rengîn dît... Roj jî cîhê xwe bî firê ke-

59

tîbû û hatîbii nik me û li ser manqalê venîştibii. Ew, di man-qalê de, bi rengê xwe yê xwînî her mezin dibû. Dema ew peyvên ku jî devê te derdiketin, perda bêdengîyê diqelaşt, mîn lî roja rengîn fedîkk. Min wê şevê her li roja xweşîk nihêrî. Roj, ew rengê sor û spehî ez dîl gktibûm. Min ewçend bi dîqet û bî hezk lê nîhêrî ku min tê de, di nav ew rengê xwînî de çend qelaş - yan jî xêz - dîtîn. û min tiştekî dîn jî dît; di nav ew rengê sor yê bedew de şopên janên kîir îi bî keser... min ew şop hîlanîn û hingê ez têgihîştîm: Jana ku lî ser serpêhatiyên me, xatkên me û bîranînên me veniş-tîye, pk, pk, pîr kevn e, bî qasî ew stran, destan û peyvên stran û destanan kevn e.

Hîngê heş ji serê min çii, doralî li ber min bû reş, çermê mîn vekîşîya ser hev, mîiyên laşê min bûn qet qetî.

Mîn - bî keser - xwe spart wan peyvan. Hingê, wê gavê, min lî wê derê pir tişt daxwaz kirîn. Min xwest ku bîla ew peyvên kevn bîbin mifte û deriyên ku li ser me hatine gk-tîn, yek bî yek vekîn. min xwest ku tîştên wê odê ku lî ber çavan bûn, bîla bihatîna vejandin. Min xwest ku dilopên barana gur ku lî derve dibarî, bîla yek bî yek bî peyvan

bîhatîna vejandin û wan tovên serîhildanê di dîlên tksok de bîçandina. Gul, ew gul hatin bîra min û min dîl kir ku bîla gul bî peyvan bişkiviyana, bila bi peyvan bûbûna rengîn û bila bî peyvan bîhn bîdana.
Belê, min daxwaz kk... min pir tîşt dîl kkîn.
Tu li wê derê, lî oda biçûk ji me veqetîyabiiyî û çûbûyî cîhana peyvên kevn û rengîn.
Haya te hew jî me hebû.
Hebûn û nebûna me qet bala te nedikîşand. Tu - çavên te gktîdî cîhana peyvên rengîn de dîmeşiyayî. Tu bextî-yar, kêfxweş û serfkaz bûyî. Agkê ku li hember me bû, riiyê
60
te ronî dîkir û di wî rîiyê ronî de kêfxweşî dîxuya. Tu li wê odê bûbûyî niwênerê cîhaneke ku êdîH pey me mabû, me H pey xwe berdabii. Belê, tu bi çavên xwe yên kor dibûyî şa-hîdê dewr û dewranên rabirdîi. Te dîxwest - bî peyvên xwe yên rengîn, bi cîmlên xwe yên kurt û bi bîcaranîna wan - ji wê cîhanê sîlav bînî. Weke ku te dixwest bêçaretî û be-lengaziya me ya îro têxî bîra me û ji me re bibêjî, «merîv dîvê li do, li cîhana do û li tecribên do bînihêre.»
Li wê derê, li hember roja sor dil û mêjiyê min germ bûn. Ez sermest bûm. Peyvên rengîn bûn weke dilopên baraneke germ û bi ser min re hatin, li ser serê min barîn. Ez H wê derê şaş û mat - belê, şaş û mat - mam. Heta hingê mîn bawer dikk ku gelek peyv û qisên min mkî bûn. Lê min lî wê derê dît ku na, ne wisan e. Min li wê derê dît ku peyv ii qisên min jîndar, xurt û wekî pêtên êgk ki. Min li wê derê dît ku peyvokên min yên dilşewitî - bi gotina te wêjeyên min - diçkîisin.
Ez bi vê yekê pir û pir û pir kêfxweş bûm.
Herweha ez şermezar bûm ku min stran, destan û çîrokên xwe di ew salên xwe yên zaroktiyê de hîştibûn. Ez pir û pir îi pir şermezar bûm.

Ma te dê hîn çi bikira, kalê rind, te dê çi bikîra?..)
Di wê navberê de, bilûra kalo kete bîra min. Rast, kabi-
lîir lî kîi bii, çî pê qewîmî bû? Bilûr ne li hembêza kalo bû,
ew li holê jî nedîxuya. min vê yekê jî kalo pksî.
- Qet meraq meke, wî got. Ew lî vê derê ye.
Hingê şîvan û gundî dîsan bî şîin de vegeriyabûn û kalo jî
şivên xwest ku ew bilûrê bîne. Bilûr dî bin bahlîfa kalo de
bû! Kalo bîlûrê dixîst bki serê xwe û dinîvîya! Bilûra delal
61
niha dîsan hatîbii hembêza xwediyê xwe. Bilûr dîsan bî hel-
qe, qul, reng, dirêjî û delaliya xwe dîbkiqî.
- Dan û standina min û bilûrê dîsan - wekî her carî - baş e,
kalo got. Tu gazîncîyên min jê tune. Lê belê, ez bawer dî-
kim ku ew hînek jî min tengizî ye. Ez hew dîkarîm weke be-
rê, bî hêsanî jê her celeb deng derînim. Çenga min diweste
îi dest û tiliyên min dîhezîn. Kêfa te ji vê bilûrê re hatîbû, ne
wîsan e?
Mîn tîştên ku şivan û gundî anîbûn, dixwarin. Mîn, nan di
devê min de, bi kurtebkî bersîva wî da:
- Belê, pir.
Mki dixwest ku bîla ew bipeyivîya.
- Bînihêre, ev bilûr, bilûreke gelek taybetî ye. Ev bilûr ji
çiqil û şaxên darekî pir taybetî çêdibîn. Navê vîdarî Kevîik
1. Ev dar li her derî peyda nabin. Ew bi tenê lî deverên Ciz-
ra Botan, li ser çîyayên nêzîkî Cizîra Botan û li doraliyên
çiyayê Agrî peyda dibin. Ev darekî pîr hişk û metîn e. Şa-
xên wî ne xwar in. Ew şax tên bkîn, senîfandîn û bi dîi re jî
çêkkîn. Jî bo karekî weha zirav û hiir, pir sebk û hunermen-
dî divê. Hevalê min yê gorbehîşt ku ev bilûr jî min re çêkk,
çar sal lî ser bilûrê xebitî.
Tam çar sal! Berê, dî wextên
bihurî de hoste û hunermend hebûn ku bi best û evîn karê
xwe dîafirandin... Ew evîndarên karê xwe bûn... Ew wext

bîhurîn, li me qulipîn... Bejna bilûrên weha bi giştî 70 cm.

1. Insan dîvê hosteyekî jêhatî be da ku bikarîbe jê deng derxîne.

Çima, ma jî van deng dernakeve? min bi xeşîmî jê pksî.

- Fermo, bigke, bîcerîbîne. Hele em bînihêrîn ka tu dê jê deng derxînî, wî got.

62

Ev cara pêşîn bû ku min ew bilûra delal dîgkt destên xwe. Ew bi rastî jî spehî bû. Min hêdî hêdî devê bilûrê bk lêvên xwe û min xwest wê puf bîkim. Lê, deng jê derneket. Min çend carên din jî - pihêt - ew puf kir. Lê nedibû, mki nedî-karibû jê deng derxista... Gewrî, tîlî û lêvên min bêavil dîle-bîtîn. BUiir ji min bêtir înadkar bû. Gava min bilûrê lê vege-rand, min jê re got:

- Wisan dîxuye, ev bilûr bi sîhêr e.

- Naxêr, wî got. Ev ne bi sihêr e. Ev jî weke her bilûrî, bi-lîirek e. Lê, hînek xusiisiyetên wê ji yên din cihê ne, yanê jê re hostahî divê. Insan divê wê baş binase, xwe li ser bîêşî-ne û lê hîir be. Jixwe bela û bextreşiya vê bilûrê jî ev e! Ji ber ku ew hostahiyeke hîir û tenîk divê, dostên wê her kêm-tk dîbin... Em kêm dibin... Gava ez bimirim, ez dê bilûrê jî kurê dostekî xwe re bişînim. Dostê min û kurê wî li aliyê din yê sînorê dijîn. Lawik pir jêhatî û jîr e. Ew hînek ji bilîi-ran jî fahm dike. Ew dikare, bi wext, bilûran baş bînase û bî-be hostakîjîr.

Min di zaroktiya xwe de tim û tim bi navê «Dengê Bilii-rê»

stranekc dibihîst. Kalikê min bang min dikk û dîgot, «Serdaro, de were dîlana Dengê Bilûrê...» Ew stran, jî nû ve, H wê derê hat bîra min. Ew straneke xweş bû. min vê yekê jî kalo re got û hewl da xwe ku ez wê stranê bifikînîm.

- Belê, ez bi wê dizanim, kalo got. Ew straneke pîr xweş e îi bêtîr li doraliyê Botan û Qerecdaxê tê gotîn. Hîn çî stran,

dîlan, dastan û çîrok hene!.. Dî pkanîya wan de taswîr, sa-
Hxdan û pesna bilûr û bilûrvanê ecêb xweş e. Ev taswîr, ev
salixdan, ev pesndan û ev celeb gotin li gor nie ye. Em gundî
ne, em koçer in. Bê guman, tu pê dizanî... bilûr û bilûrvan dî
vê jîyana me ya koçeriyê de cîhekî pir muhîm werdîgkîn.
63
Em hinekî din jî bi hev re rîinîştîn da ku kalo em «bî der
kîrin.»
- Ez westiyam, êdî ez dê razêm.
Wî dîsan tiştên ku ne
yên gundiyan bûn, dîgotîn. Ma
gundî gava xwedanmêvan bûya, dîgot «ez westiyayî me?»
Gava min xwest ku ez jî rabim, wî ji min re got:
- Cîhê me pir e. Tu dîkarî hem li vk, li ba min bimînîii
hem jî li ba şivên. Tu çawan dixwazî, êdî wisan bîke. Tu bi
qîma xwe yî.
- Gelek spas, min gotê. Ez naxwazim te eciz bikim. Ez dê
lî nik şivên bîxewîm. Weha hîn çêtir e. Naxwe, em dê her
gav lî nik hevûdu bin?..
Edî me rabûn diviya. Me kalo li wê derê, li oda wî bi tenê
hîşt û em derketin der. Ez dê heftekê, zêdetkîn, deh roj H
wê derê bimama. Min dê hem ew stran û destanan - bi qasî
ku wext dest bida - berhev bikirina û hem jî kalo ji nêzîk ve
bînasiya. Jixwe wext li min teng bii. Min diviya wexta xwe
baş bi kar bianiya.
Nîvê şevê, gava ez û şivan ketin nav cîhên xwe, min xwest
jê kalo bipirsim. Min jê re got:
- Kalo xwedî şexsiyetekî pîr paqij û balkêş e. Dan û stan-
din û herekên wî gelek qedkgkan, hurmedtijî û asîl in.
- Belê, wisan e, şivên got. Kalê me pir rind û pir paqij e.
Lê belê, şivên bi xwe jî kalo baş nedinasî. Wîgelek qedir
ii qîmeta kalo dîgkt, di şixulên rojane de jê re alîkarîdikk.
Ew her gav pê re bû, pê re dipeyivî û her dixwest alîkariya

wî bîke. Lê bi tenê hewqas. Wî di esasê xwe de nedizanîbû ka kalo kî ye. Kalo ne ji gund bû. Ew berî demeke dirêj hatibû û li gund bî cîh biibû. Kalo di demeke kurt de - ji ber zanîn, hurmedkarî û serwextiya xwe - bûbû merîvekî bî qî-
64
met û qedr. Herweha ew bûbû dostê gundiyan û ketibû nav jiyana wan ya rojane. Wî li ser xwe, li ser rabirdiiya xwe tu tişt ji gundiyan re negotibû. Ya rastk, wi tiştine gotibûn, lê kêm. Gava ew nû hatibû gund, hingê ew ne kor bû. Korîtî berhema ev çend salên dawîn bû. Ew hêdî hêdî kor bûbû îi dinê li ber wî reş bûbû. Kalo bi ber vê yekê neketibû û pê neêşiyabû. Wî korîtî jî - weke her tiştî - bi hêsanî pejînan-dibû.
Mki tîştekî gelek meraq dîkk, ma kalo her bi tenê bii? Belê, ew her bi tenê bii. Dema ew nii hatibû gund jî û ni-ha jî...
Tiştên ku şivên gotibûn, ne ji van zêdetk bûn. Lê belê, ev danezanînên kurt jî bûn alîkarên min. Min xwe niha hîn çêtk hîs dikk. Berî ku ez bikevim xew, ez weha fikkîm; «belê, dema min jê re got ku ew ne ji vê derê ye, ez ne şaş bûm...» û min, bi westa wê rojê, xwe berda hembêza xew-nan û pê re çûm...
Dotira rojê tiştekî gelek balkêş qewimî. Gava ez û şîvan ber bi nîvroyê çûn oda kalo, wî, bi dîi çend gotinan re, dest pê kir û behsa xewneke xwe ya wê şevê kir.
- Ez nizanun ev xewn xêr bû yan jî şer? Ew, xewneke pk dijwar û ecêb bii...
Bi dû re, wî got, «lê guhdarî bikin, ew tiştekî weha bû» îi dest pê kir, bi dest behsa xewna xwe kk:
- Ez bawer dikîm, ez li derekî weke çolê bûm. Lî pêşiya mîn ji qûmê deryake bê ser û ber û li pey min jî valahiyeke pk fueh û tarî hebû. Valahiya li pey min tîştekî weke ave ron bû. Lîngên min tam lî ser ew xêza ku valahîya li pey min

ii derya qiimê
H wk digihîştîn hevîidu, bûn. Wekî ku ez H
ser pka jî mû ziravtk ya
Skatê bûm. min qet keys tunebû
65
ku ez ber bî paş bîzîvkîyama û lî pey xwe binihêrîyama. Lê dengekî xoftîjî nîşan dîda ku ew valahiya lî pey mîn, bi tehliikan tijî ye. Pêşiya min jî weke xalîçekê yan jî weke bexçekê xweş û rengîn bii. Tîşt û reng lî ber min dkeqisîn. Li her du aliyên min, du sîtiinên mezin, spehî û xweşneqî-şandi hebûn. Ew ji min pir bî dîir bûn. Lê ez baş dizanim ku ew sitîin bûn. Ew bî hemîi xweşî û spehîtiya xwe dixuyan.
Di navbera min û sitiinan de gelek tîştên cîirbecîir û rengîn rêzkkî bûn. Bi qasî ku tê bîra mîn, dî navbera min û sîtîina alîyê çep de - bî rêz - ev tîşt hebûn; mînbereke Beyazidê. Mînber xweş neqîşandî û rengtarî bû. Lî pey mînberê, tisbiyeke pir xweş ku ji kevirê yaqiidî çêbûbû, hebû. Tisbî dîbiriqî.
Li pey tîsbiyê, penîiseke ji mii û şiişa mkekebê hebûn. Li pey wan jî şiir û xençereke bi zîv tamandî dîbki-qm... Lê tîşt ne bî tenê hewqas bûn. Li pey %m û xençerê du mehînên pir xweş rawestabûn. Dengê mehînan asmên radikk; mehîn dihîrîyan. Lî nik mehînan jî koneke berz hebû. Kon bî mîiyên reş hatibû hunandin. Li pey van hemû tiştan jî, li nik sitîinê, jinek rawestabû. Jinik pir xweş û tazî bû. Jînik ji min pir bi dîir bii. Lê digel vê hîndê, bedena jinîkê bi her awayî dixuya. Jinîk dîbkiqî. Belê, ewdibkiqî. Tiştê ku herî bala min dîkîşand jî ev bii; porê jinikê ber bî jor dîbû, ber bî asmên hîldîkişiya. Weke ku jînikê dixwest jîn û jîndariyê biguhuzîne stêrikên mkî ku di nav refên stêrikan de nedîçkûsîn. Belê, bi qasî ku ez têdigîhîştim, şev

bii. Asman tijî stêrik bû.
Herweha dî navbera min û sitiina alîyê rastê de jî gelek tişt hebûn; ev alî jî bi xalîçeke Ecemê dest pê dikk. Xalîçe bi dest hatibû hunandin û ew rengîn bû. Lî ser xalîçê jî çend lîb zêr bi awakî peregende dixuyan. Şewqa zêran rîipelên
66
kkêbekê ronî dikirîn. Kitab jî li ser xalîçê bii. Riipelên wê yên rizîyayî vekirî bûn. Li pey xalîçê û tiştên li ser, manqaleke zîvîn hebû. Ji çêbûn û neqşên wê baş dixuya ku ew manqaleke Urmiyê bû.
Dûmana ku ji manqalê radîbû,
dîgihîşt asmên. Li pey manqalê jî kîizekî şkestî û saeteke qîimê hebûn. Qîima saetê ku di çavika jorîn de bû, bî lez diherikî. Li pey kiiz û saeta qîimê jî, kursiyek hebû. Kursî dibiriqî. Belê, kursî jî eynî wekî jînikê spî bû û dibkiqî. Helbet li ser kursiyê jî tiştine hebûn; kitêbeke pîr kevn, pk qaling û pir mezin. Tiştê herî balkêş jî ev bû ku riipelên kitêbê li wê derê, di nav wê ronahiyê de, yek bî yek bi firê diketin. Ew ber bi asmên difiriyan û li asmên, li nik stêrikan dibûn kewên spî.
Aha, xewna min weha bû. Ez ji kii dizanim!.. heye ku xewna min hîs û daxwaziyên ku di heş û mêjiyê min de xwe veşartine, dianî zimên... Rewş balkêş bû. Ez şaş mabûm. Mîn nedizanibû ka ez dê ber bi kîjan alî biçûma. min dixwest - bi carekî - di her du aliyan de bim. Tiştên her du aliyan jî mane didan jiyana min. Ew hemîi, perçên jiyana min bûn. Heyin û tişt bi awakî pir ehmeqî hatibûn hember hevûdu; mînber û xalîçe, hesp û saeta qîimê, jîn û kîtab. Aha ev tişt, hemii ev tişt hatibûn hember hevîidu! Ev yeka diviya lîstikekî jiyanê bûya... Di xewnan de jî daxwaziyên însanan bi cîh nedibûn. Ez diviya biçûma vî aliyê yan jî wî alîyê. Min hilbijartin diviya...
Xewna kalo bi her awayî dihat bîra wî. Min hem çaya ku

şîvên çêkkîbû, vedixwar û hem jî, di wê navberê de, min ji kalo re got:
- Heyret, xewna te bî her awayî tê bîra te. Bi dîi xewnê re, êdî ew zîi bî zîi nayê bîra merivan. Meriv dîvê hosteyê
67
xewnan be ku bîkarîbe xewnên xwe bîne bîra xwe. Ez bawer dîkîm, xewn di jiyana we de cîhekî girîng digkîn.
Kalo bîskekê bêdeng ma. Wî hêdî hêdî çaya xwe vexwar ii piştî ku çaya xwe qedand ji şîvên qedeheke nii xwest.
Bi dîi re jî - weke şeva bihurî - dest bî pêçandina cixaran kk.
Wî di wê navberê de bî dengekî nîzm got:
- Helbet, bê guman xewn di jiyana min de cîhekî muhîm werdigkin. Ez tevî xewnên xwe dijîm. Ez, ji mêj ve ye, her bawer dikim ku xewn û xeyal tahmeke xweş didîn jiyanê.
Bî baweriya min jiyaneke bêxewn weke kahniya avmiçiqî ye.
Wekî ku însan ketîbe bîreke zuha. Yanê, wekî ku însan ketibe bîreke bê feyde, bêkêr û bêmane. Herweha hiin divê jî bîr nekîn ku êdî ez nabînim. Dema dinê li ber min hêdî hêdî reş bû, min xwe spart xewnan. Ez car-caran ber bi wan derîm. Ez di dînya wan ya bêwext û bêsînor de rehet dikîm.
Bi vî awayî xewn îl rastiyên rojê dîkevki nav hevûdu. Ez di vî gundî de, di vî cîhê bêdeng de, payiza umrê xwe bi xewnan dibûrim. Ez divê vê yekê jî bibêjim; ev celeb jiyîn kêfxweşî dide min.
Belê, ez li nik kalemêrekî pir taybetî, pir cihê bûm. Ew li hêvîya mkînê bû û vê yekê ew kêfxweş dîkk! Min jê re behsa kalekî din ku li hêviya mirinê bû û bi vê yekê kêfxweş dibû, kir; Jorge Luis Borges.
- Çavên wî jî nabînki. Jiyana wî ya nû jîdi nav tarîtiyan de derbas dibe. Wî lî ser vê jiyana xwe ya nû helbestên gelek

xweş nivîsîne. Wî bî navê «Pesna Sî» desteke helbest nivîsîn
ii tarî û şeva reş pesinand.
- Wîsan dîxuye, ev şaîrê ku tu qal dikî, şaîrekî balkêş e,
wî got. Eger çavên mki bidîtma û teqeta min hebûya, min
68
dê şiîrên wî bîxwendina. Bê guman, hinek alîyên kesên kor
wekhev in. Dema perda taritiyê bi ser çavan re tê, hingê jîn
jî diguhere. Daxwazî, hîs, fîkk, kêfxweşî diguherîn. Weke
mîsal, dema çavên min didîtin, min rast bi rast li bîbikên
çavên kesê ku dipeyivî, dinihêrîn. Bi vî awayî min ew însan
baş fahm dikir û dinasî. Çavên min her li ser bîbikan bûn.
Lê niha ne wisan e. Ez niha guhên xwe didim ser kelime,
cimle û dengê kesê ku dipeyîve. Ez dixwazim ji deng û cîm-
lan fahm bikim ka ew însanekî çawan e. Ez dîkarîm bibêjim
ku ez bûm hosteyê vê hunerê jî. Ez çi bibêjim?.. Pk, pir
dijwar e ku însan bîkaribe dinya însanekî kor bide zanîn.
Wisan dixuye ku însan divê ev rewşa han, bi xwe, bijî...
Piştî ku wî ev tişt gotin, ew bêdeng ma. Ew westiyabû.
Min jî di wê navberê de bi meraq li wî nihêrî. min ev kale-
mêrê ku ez li nik bûm, nedinasî. Lê min xwe li nik wî weke
merîvekî xerîb jî hîs nedîkir. Çima ez li nik wî eciz nedi-
bûm? Çima min dixwest ku ez wî binasim û li nik wî bim?..
Laşê wî yê biçûk û qermîçekên li ser rîiyê wî hema bala
meriv dikîşandin. Xêzên li ser eniya wî pir kiir bûn. Rîiyê wî
jî bi «qermîçekên kalitiyê qelişîbû.»
Riiyê wî pir bî hestî bû û hestî baş dixuyan. Riiyê wî hiir bû, lê çavên wî mezîn
bûn. Çavên wî dibkiqîn. Ji dûr ve qet nedixuya ku ew kor e.
Li wê derê, gava min li çavên kalo nihêrîn, - weke niha tê bî-
ra min - ez weha fikirîm; «ma ev ne neheqî ye! Çima ev ça-
vên ku dibîrîqin, dê nebînin!»
Li ser lêvên wî yên zirav jî şopên dosta wî ku her pê re
bii, yanê tîtiinê, hebûn. Di wê navberê de, gava çavên min li

ser xêzên riiyê wî dîgerîyan, wî dest pê kir û got:
- Ez xwe hinek westîyayî hîs dîkim. Ez dixwazim hinek
westa xwe bigkîm. Bî dîi re jî em dîkarin dest bî xebata xwe
69
bikîn, erê? Herweha, em zêde nepeyîvîn, çêtk e ku em zêde
kar bîkîn. Kêfa min ji qisên zêde re nayê.
U her tişt li gor daxwaza kalo bii; me dest pê kir û em xe-
bitîn. Em her roj 4-5 saet xebitîn. Min bi kêfxweşî çîrok ii
destanên ku wî digotîn, nivîsîn û herweha ew kîşandîn kase-
tan. Ev çîrok û destan jî perçên cîhana wîbûn. Hîngê, dema
em bî hev re xebîtîn, min çêtk dît ku ew jî bilûra xwe pk
hez dîke û pir xweş li bilûrê dixe. Belê, hingê min dît ku
cîhana wî jî bilûr, çîrok û destan, xewn, fantazî, dewr ii
dewranên rabkdû, edebîyad û musîka sedsalên
17-18 an
hatiye pê. Hîngê min - ecêbmayî - dît ku ew ji îro, ji peyv,
cimle û zimanên îro dkeve, jî wan bî dûr dîkeve.
Carekê, berî ku em dest bi xebata xwe bîkin, wî got:
- Qîse û kelimên îro jî bo min tu tîşt nabêjin. Ez nebêjim
ku ez ji wan nefret dikim, lê kêfa min jî wan re nayê. Ya ras-
tkîn, ez nîkarîm jî wan hez bikîm. Ez nîzanîm... lê ez wisan
bawer dîkîm ku qîse û kelîmên îro li hember însan û însanetiyê
nizmahîyek hîldigkin. Weke ku ew bi însan û însa- netîyê henekên
xwe dîkîn. Ew sextetî îi sextekariyek hîldîgkîn, weke ku qîse û kelîme
bûne cîhê rev û veşartinê.
Kesên ku dîxwazin xwe û şexsiyetên xwe yên rasteqîn veşê-
rin û xwe bi awakî din nîşan bîdin, xwe dîspêrîn qîse û ke-
lîmên îro. Axxx, ka ew zîman, qise, cimle, kelîme û dengên
kevn! Zimanên neteweyên kevn pir cihê bûn. Hem deng ii
hem jî mane di wan de hebûn. Kelîme bêneqş, lê tîjî bûn.
Her kelîme weke rêzeke şîîr bû. Ew tîjî û bi hêz bûn û mane
didan tîşt, hîs û fîkkan... Ka ew zîmanên kevn yên Yewnan,

Latîn, Ereb, Fars, Asîir û Medan!.. Ka ew dengê kurt ku bi «A» û «0» ve tîjî bûn! Ew îro tunene, ew wîndabûn, wan em terk kkîn. Hemîi winda bûn... Di dewsa wan de, em niha
70
dengên qels, zirav, kurt û bêruh ku bi «E» ve tijî ne, bi kar tînin.
Qise û kelîme zêde bûn, ji kelîman deryake sûnî, deryake derewîn ava bû da ku qahr û derdên dînya me ya pîr û bkîndar nexuyên. Ew weke barana çilê bi ser me re tên. Ew bêrawestan vê yekê dikin...
(Kalê rînd... min li te guhdarî dikir. Dengê te weke bayeke hîinik li doraliyê guhên min dkeqîsî. Weke ku ez dî berbanga şcveke bêxew de bûm. U... belê, û min dixwest ku ez mana derya sîinî, derya derewîn ya qîse û peyvan fahm bikim.
Min divê ku ez ji te re bibêjim; niha, gava ez te dinîvisînim, ez pkaniya wan peyvên ku li dor lampa li ser masa mîn ditîrin, ji xwe bi dîir dixînim. Çima? Belê, da ku ez dî wê derya sîinî û derewîn ya peyvan de nefetisim. Herweha ez wan peyvên kêmmayî ku hê jî li dor lampê dîfirîn, ango ew peyvên ku min ji masê bi dîir nexîstine jî, - bî rêzdarî - hîldibijêrim. Mixabin, ev kar ne hêsan e.
Ez nîzanim ka ew peyvên ku ez hildîbijêrim, peyvên herî pêwîst û herî baş in yan na?
Lê nivisandin, nivîsîn jî - bi awakî - rêwîtî ye. Ew, celebeke rêwîtî ye. Rêwîtiyekê di nav pêlên deryayê de. Rêwîtiyeke ku bi maceran tijî ye. Meriv divê di vê rêwîtîyê de li dijî pêlên deryayê şer bike da ku bikarîbe rîya xwe bibîne, riyeke rast bide ber xwe. Eger meriv dixwaze tiştên ku hatîne jiyîn, jî nii ve vejîne, hingê ev şer pêwîst e. Belê, ev şerê dijwar pêwîst e. Ez niha tiştên ku ez bi xwe jiyame yan jî ez xeyal dîkîm ku ez jîyame, didim ber pêlên deryayê. Ez serpêhatiyên xwe, daxwazî û fikrên xwe didîm ber pêlên der-

yayê da ku ew bikemîlin, ew zelal bibin, ew bi awakî xweşik
ii edebî werîti nivîsîn, ew bineqişin, ew bîçiriisîn... bi kurte-
71
bkî, ew bikaribin tiştên ku hatine jiyîn, jî nii ve vejînîn. Ca-
rina ev lebat, ev şerê dijwar min sermest dike, bîhn li mîn
dîçîkîne.
Eger ez bikarîbkn li hember pêlan rawestîm, hingê ez dê
hinek rehet bikim. Hîngê peyv û cimle dê bi rengekî zêrîn li
ser kaxiza spî bireqisîn, bîstêrin. Lê belê, pkaniya caran ev
nabe. Pêl û kef li min dîqulibîn, belê, ew lî min diqulibin...
Kalê rînd, ez divê li vê derê jî li xwe mîkur werim; te û ji-
yana te nivîsîn ne hêsan e. Te peyv û qisên te divên. Meriv
dîvê wan qise, peyv û gotinên kevn bi kar bîne da ku bîkari-
be te û jîyana te binivîse. Ez dê wan ji kîi peyda bikim,
bibînim? Pkaniya peyvên ku li dor lampê difkin, ne ji
wan în. Wan peydakîrin ne hêsan e, li hember pêlan şerkirîn
ne hêsan e, li hember pêl û kefên wan rawestîn ne hêsan e.
Belê, weke ku te digot, axxx ev peyv, ax ev peyv ii
cîhana wan ya zêrîn, rengîn, bi sk û sihêr...
Ez divê, niha, li vê derê serpêhatiyeke xwe jîbînivîsîm...
Carekê, bi dii xeberdana me ya gund re pênç sal, min li
welatê xwe yê xerîbiyê, li jinikekê guhdarî kir. Ez li semî-
nerekê bûm. Semîner - dîsan - li ser ziman, qise, peyv û hêza
wan bii. Semîner li saloneke pir spehî bii. Ez çûm û bêdeng
H koşeke salonê rûniştim. Jineke xweşik û dirêj bizimanekî
biyanî ku ez nû fêr biibûm, dipeyivî. Wê behsa peyv û hêza
peyvan
dikk. Cimlên wê yên pêşîn qet ji bîra min narin.
Wê weha digot; «îi peyv bûn ew mekanên ku meriv tê de
hevûdu dibînîn... mekanên wîsan ku MIN û. TE yanjî£Z ii
TU li wê derê dîbin EM û ME. Ev mekan, mekanên wisan in
ku li wê derê azadî hêza esasî ye û dan û standin, hevpeyvîn
hevîidu fahmkkin celeba esasî ya jiyanê ye. Herweha, tiştê

herî gkîng, ev mekan me, yanê merivan radigîhînin cîhane-
72
ke wekhev. Cîhaneke wisan ku lî wê derê peyv û şîxul, qîse
ii kîrde hevîidu temam dikin û wekhev în. Ew li ser wek-
hevîyekê ava dibin.
Ez divê vê yekê jî bibêjim ku min merivên weha ku giran-
bîhayîya peyvan hîs dîkîn, pir kêm dîtîne. Ev jînîk, yek jî
wan merivên ziravbihîstiyaran bû. Wê hêdî hêdîdîgot; «me-
riv hewcedarên hevîidu ne, meriv hewcedarên van mekanan

1. Meriv dikarin bi alîkariya van mekanan bîafkînîn, ava

bîkin, ji nii ve bînin pê. Heta meriv di nav mekanên weha de nebin, ew nikarîn peyvan binasin, wan ji nîi ve vejînin.

Meriv divê her gav jiyaneke nû bide peyvan û wan bi jiya-
neke nû bikemilîne. Ev mekan, germ in û ji bo me ne, ji bo
merivan in. Meriv dîkarin xwe bispêrin van mekanan û xwe
jî zor û zordariyê bi dûr xînin. Lê, em îro bî jan û dîlêşî
dibînin ku zordar, mêrkuj, xwînxwar dixwazîn van meka-
nan bo armancên xwe yên qkêj bi kar bînîn.
Ev, êşeke mezîn dide me, em pê dîlbkîn dibin.»
Ez li wê derê fikirîm ka di xeberdana wê û te de tu ferq hebûn?
Ew jana ku wê behs dikir, wê gavê, ji çavên wê dixuya.
Ev jinîk ji jinên din yên welatê min yê xerîbîyê cîhê bii; po-
rê wê dkêj û reş bû, çavên wê reş bûn. Ew . zarşîrin û rîibi-
ken bii. Min ew - bi dii re - nasî. Me dilên xwe danîn ser
germiya wan
mekanên ku wê behs dikirin û em bi hev
re bûn dost. Dostîya me hem pir xweş û hem jî pir ecêb bû.
Ez zîmanê wê nû fêr bûbûm. min nedikaribîku ez başbipe-
yivîyama, daxwaz û mebesta xwe bîaniya zimên. Wê jîbi
zimanê min nedizanîbii. Mîn, bi zîmanê xwe yê nû û kulek,
dîxwest jê re tîştine bibêjim. Wê jî bi peyvên xwe yên
nerm û spehî xweşiyên nû nîşanî min dîdan.

73
Şevekê, piştî ku me bedenên xwe avêtîn nav pêtên êgk, min dest pê kir û bi zimanê xwe yê zikmakî peyivîm. Min jê re, bî dirêjahiya saetan, tiştine gotîn. Min peyvên te jî ku mîn ji çîrok û destanên te helbîjartîbûn, bî kar anîn. Wê - bê ku tu tişt têbigîhîyê - li min guhdarî kk. Wê bî tenê guhdarî kir. Wê bi sebr guhdar î kir û paşê j î got :
- Serdar... Ez te têdigihêm, Serdar, ez te fahm dikim...
Mîn jê re behsa peyvên te kkîn:
- Ev peyv dilsoj în, keserkîir în, ev dilopên jan îl keserê
1. Ev ji gor û qebrîstanê rabûne û jî nii ve vejiyane...

Wê dîsan tu tîşt negot. Wê, car bî car, li min nihêrî û paşê jî gkiya. Ew gkîya. Ew bî tenê gkîya.
Piştî çend rojan, gava me dîsan hevûdu dît, min jê re behsa destanên te û - herweha - şexsiyetê te kir. Wê bi best guhdarî kir û tîştine pksîn. Gava wê bîhîst ku te ji min re tiştine berdane, wê xwest tîştan bibîne.
- Ez dixwazim wan bîbînim, wê got.
Min jî ew tiştên te nîşanî wê dan. Dîsan tu peyv û qise ji devê wê derneketin. Wê bi dkêjahiya saetan li tiştan nihêrîn û bi dîi re jî ew gkiya. Ew bi tenê gkiya...)
Roja dawîn,
berî ku ez bi rê kevim, ez dîsan çûm oda
kalo. Ew dîsan, wekî her carî, li kêleka manqalê rûniştibû. Her tîşt wekî xwe bûn. Dî oda wî de bi tenê guhertînekê hebû; çîpe çipa dilopan rawestîyabii.
Ez çûm û li nik wî rîinîştim û min jê re got ku ez divê êdî herim.
- Naxwe, wexta çûyînê hat? wî got. Pir baş bû ku ev barran sekinî. Rehmeta Xwedê hat hawara me. Em dê niha bîkarîbîn hînek nefes bîgkîn.
74
Ez tênegihîştim ka wî çima hewce dît ku behsa baranê

bîke.
Dema ew dipeyivî, min jî li oda wî nîhêrî. Tiştên odê pk kêm û pir basîd bûn... Qet tu tiştê zêde tunebû. Çavên mîn li ser tiştan geriyan û paşê li derekî rawestiyan; rêz. Ew rêzên li ser dîwêr, her bala min dîkişandin. Wisan dîxuya ku rêz ji mêj ve bû ku hatibûn nivîsîn. Jî ber ku êdî ew zer biibûn. Min ji kalo pksî ka ev rêz yên wî bûn.
- Naxêr, ew ne yên min in, wî got. Melayê Cizîrî, ew rêz yên Melayê Cizîrî ne. Melayê Cizîrî, yek ji wan şaîranan e ku ez jê pir hez dikim.
Min navê Melayê Cizîrî bihîstibû, lê min baş nedîzanîbû ka ew şaîrekî çawan e. Berî ku ez Melayê Cizîrî ji kalo bîpksim, wî gotina xwe domand.
- Ew di sedsala 15 an û destpêka sedsala 16 an de jiyiye. Ew, yek ji wan şaîrên herî mezin yê Rohîlata Navîn e. Lê mixabin, îro ew baş naye zanîn û nasîn. Kesên ku Melayê Cizîrî dinasin û pê dizanin, pir kêm û bi sînor in. Ew mezin bû. Yanê ew divê neye jibîrkkin. Ji zîi ve, dema ez hê li ser xwe bûm, min ew rêz nivîsîn û hîlawestîn ser dîwêr. Ew her li wê derê man.
Bê guman, min mana rêzan jî meraq dikk. Lê belê, rêz bi kurdiya kevn hatibûn nivîsîn. Ji bo min zehmet bû ku ez wan têbigîhêm. Kalo, ji bo vê yekê jî, alîkariya min kk. Rêz weha bûn:
Peywest e tu her bangê me kî şupPietê nayê
Bê yar û niey û sazê min go neyêm ez
Hercî te bivêtin ji me wer can hi xwe hit
Cana bike feniianê vewestay im ez
75
Sed şîşî li dil da ji mihrê me «mela»
Lew her bi fîxan mîslê ney û nay im ez
Rêz xweş bûn. Min jê pksî ka min dikarîbû rêzan binivîsandîna.

- Belê, wî got. Belê, tu dikarî bini-visî. Jî bo çi tu dê wan nenivîsî?
Piştî ku min rêz nivîsîn, min jê pksî:
- Baş e, meriv dîkare helbestên wî yên din jî peyda bikin? Niha, îlam helbestên wî yên din jî hene.
Wî bi qasî kêlîkê lî min nîhêrî - weke ku çavên wî didî-tîn - û keniya. Min tu mane neda kena wî. Bi dû kena xwe re wîgot:
- Helbet,.. şiîrên wî yên din jî hene. Şiîrên Melayê Cizîrî pk in. Ew li derine hatine çapkirin jî. Şiîrên wî pir xweş in. Ew, yek ji hosteyên pêşîn yê zimanê me ye. Eger tu baş lê bigerî, tu dê bikaribî wan peyda bîkî. Tu divê lê bigerî ii xwe pê bîêşînî.
Wext hatibû, ez dîviya ji kalo veqetiyama. Lê belê, min hê jî dî derheqê wî de tîştekî nedizanîbû. Wî li ser xwe tu tişt negotibûn.
- Edî min çiiyin divê, min got. Ev bûn çend roj ku em bi hev re ne. Lê te di derheqê xwe de tu tişt negot. Eger min bikarîbûya te - hinek bûya jî - binasiya, ez dê kêfxweş bii-bûma.
Wî bî dengekî bîlînd bersîva min da:
- Serdaro!.. Tu nîkarî bibêjî ku tu qet min nas nakî. Na, ev yeka ne rast e. Binîhêre, ev çend roj in ku em bi hev re ne îi em her dîpeyivîn. Ma qîma te bi vê nayê? Tu bawer bike, ez, jî zii ve ye, evçend nepeyivîbûm. Lê wisan dixuye ku te
76
hêvî bi tiştên din hene. Belê, eşkere ye ku tu dîl dîkî bizani-bî ka ez kî me û ji kii hatîme. Ev meraq, meraqekîbêmane ii bêkêr e. Tu bê sebeb tiştên weha meraq dîkî. Qet, bi rastî jî qet ne muhîm e ka ez kî me û ji kîi hatime. Herweha qet ne muhîm e ka tu kî yî û ji kii hatiyî,.. şivan jî û yên din jî... Em însan in, tu têdigîhêyî, em însan în. Em bîr nabin ku em ji bo jîn îjiyînê hatine dinê. Meraq, ew meraqê ku

em qet nikarin jê bifîlitin, aha vê yekê bi me dîde jîbîrkîrin. Meraq, guman, şik, nerehetî, weswese, endîşe, jîna bi lez ii bez û bi hezaran, bi sedhezaran qise û kelîme... Aha ev tişt in ku em dil xistine. Lê mizabin, hezar mixabin ku em, însan jî dîlitiyê qebiil dikin. De baş e, havîlê vê yekê çî ye? Çi dibe?

Hiii, Serdar? Ez ji te dipirsim, havilê vê yekê çi dibe? Tks, qahr, berberî, keser û westîn... Insan, însanetîji ber van tiştan diweste... Insanetî diweste...

Piştî vê xeberdanê, êdî tiştên ku min bigotina nemabûn. Ez diviya, dîsan, ber bi bakûr, bi rê ketima. Şivan tevîhespan, li der, li hêviya min bii. Ez rahîştim destên kalo û min jê xatir xwest. Gava min jê xatir xwest, min jê re got ku ez dê dîsan werim. Wî jî destê xwe bi ser milê min re gkt û got:

- Inşallah, bi îzna Xwedê, em dê hevîidu bibînin. Bî dii re jî wî ji min pirsî, «ez hêvî dikim, tiştên ku min gotin, tu eciz nekkî. Tu eciz bûyî?»

- Na, min got. Tewr ez pê kêfxweş bûm. Tiştên ku te gotin, ne tiştên vala bûn. Ez jê tiştine fêr bûm.

U gava ez ji derî derketîm, wî ji nişkekê ve ji min pksî:

- Tu dizanî Rindîkî ne û edet û torên wan çî ne?

Min nedizanîbû. Ev cara pêşîn bû ku min navê Rindiyan dibihîst. Min pksa wî, dîsan, lê vegerand.

- De dev jê berde, wî got. Ne muhîm e. De oxîr be û bila

77

Xwedê bî te re be.

Dî hevûdudîtîna me ya duwemîn de qisên kalo yên herî dawîn ev bûn. Ez - ji ber van qisan - kesertîjî bûm.

(Ax kalo... Ez û şivan li hespan siwar bûn û em ji te bi dûr ketin. Lê te bizanibûya ka min çi bi xwe re dibirin! Ka min çi bi dest xistibûn! Min miftên destanên te peyda kkibûn. Min miftên destanên zaroktiya xwe peyda kiribûn îi mîn ew bi xwe re dîbkin. Min dê bi miftan ew deriyên gktî,

nexuya, veşartî û bi sk û sihêr yên çîrok û destanan vekki-

1. Te ew mifteyên zêrhelî dabûn min. Di wê xebata me de, te mifte jî nîşanî min dabûn. Ez dîsan vedigerîyam welatê xwe yê xerîbiyê. Ez dê, li wê derê, bi alîkariya miftan vegeriyama roj û dewrên rabkdii.

Min te û gund li pey xwe dîhîştin, lê ez dê dîsan bîhatima...)

78

Dema ez vegeriyam Stockholmê, karê mki yê pêşîn ev bû; li ser Melayê Cîzîrî û Rindiyan agahîberhevkîrin. Li ser Melayê Cizîrî tîştîne bîdestxîstîn zêde ne zehmet bû. Lî ser wî tiştîne hebûn. Dostekî min li ser jîyana wî û dostekî mîn yê din jî çend helbestên wî û kovarine kevn ku tê de helbestên Melayê Cizîrî weşiyabûn, ji min re şandin. (Her du dostên min jî li dervayî welêt, lê ne li Swêd dîjîyan.)

Agahiyên ku gîhîştin mîn, nîşan didan ku Melayê Cizîrî - bî texmînî - di navbera salên I570-I640 an de jiyabû. Ew jî deverên Cizîra-Botan bii. Wî li Baxdadê zknan, felsefe, edebiyad û astronomî xwendibû. Ew hozanê Mîrê wê demê yê Cizîra-Botan Omad-dîn bû dilê wî ketibû keça Mîr û pê re zewicîbii.

Dostê min yê ku ji min re helbestên Melayê Cizîrî şandibûn, dî nama xwe de, li ser hozaniya Melayê Cizîrîjîweha dîgot; «Melayê Cizîrî şîîrên xwe li gor toreyên wê demê yên Rohelata Navîn nivîsîne. Ew şaîrê dil, eşq û tebîetê ye. Tesîra Sofîtiyê lê heye. Taswîr û pesndanên wî yên li ser tebîet, eşq û derd û keseran ecêb xweş û spehî ne. Ew dî esasê xwe de şaîrekî dilşkestî û keserkîir e, lê wî tkn û tim xwestîye dî

79

şûrên xwe de dîlopên kêfxweşî û serfuraziyê jî berpêşbike. Zimanê wî bi best e û xwendevanan dihejîne. Ew di şîîrên xwe de, bî hostetî, peyvik û qîsên Erebî, Farîsî û Tirkîjî bî kar tîne. Ev yeka zimanê wî hîn bêtir rengîn dike. Hemû

Rohelata Navîn Mela û şîîrên wî dinasm. Lê mixabin, îroj ew zêde baş nayê nasîn şîîrên wî peydakirîn jî pir dîjwar bûye.»
Nama dostê min baş nîşan dida ka çima kalo ji Melayê Cîzîrî hez dikk. Kalo, tam li gor xwe, hozanekî hilbîjartibû. Merîv dîkarîbî, li vê derê, li ser evîna kalo behsa bestekê, besteke bi derd û keser bikka. Ma kalo bi xwe jî, çend caran behsa ba û bahozên dilê xwe nekkibii? Ma wî nedîgot - digel ku ew kal bû - ba û bahozên dilê wî hê jî geş bûn?..
Belê, dan û standma kalo bi Melayê Cîzîrî û bi wan rê-zên lî ser dîwêr re niha baştk fahm dibû.
Bi alîkariya nama dostê min, tiştine li ser Melayê Cizîrî berbiçav bûbûn. Lê belê, Rindî û rewş û riwanga wan hê jî li pey mîj û dîimanan bû. Lî ser wan tu agahî tunebûn. Rind weke peyvekê di zimanê me de hebû. Ew pir bi kar jî dihat. Min jî - ji ber ku kalikê min ew pir bi kar dianî -bi kêfxweşî ev peyv bi kar dianî. Lê ne eşkere bû ka tu dan û standina peyva rind bi Rindiyan re hebû yan na. Ev Rindîtî çi bii? Rîndîkîbûn?
Besta min li vê meselê rabii û min dest pê kk, li ser Rin-diyan lebkîm. Dî nav wê keft û leftê de, rojekê ez fêr bûm ku bi navê Rindî hozanekî hebiiye. Min bi kêfxweşî bazda ii ez çûm nik hevalên ku dîkaribûn li ser hozan Rindî agahî bi-dana min. Lê, dema ez baş fêr bûm ka hozan Rindî kî bû, hingê kêfxweşiya min
di gewriya min de ma; tu dan û stan-
80
dîna hozan Rindî bi Rindiyan re tunebû. Rindî dî sedsala 17 an de li Sulêymaniyê jiyabii. Ew hozanekîbaş bû, lê ji navê wî pê ve, tu dan û standina wî bi Rindiyan re tunebii. Di helbestên wî de jî tu tişt li ser Rindiyan tunebii. Rewş bûbû bêhêvî.
Carekê, di wan rojên bêhêvî de, gava ez - bê ser û ber - H

bajêr digeriyam, min dostekî xwe yê kevn dît. Ev dostê min nii hatibû Swêd. Ev hevîidudîtin ji min re bû fersend ku ez pê re bîpeyîvim. Em bi hev re, li qahwexanekê rûniştin ii min tiştîne lî ser rewşa wî jê pirsîn. Di pişt re, gava wî pîrsî ka min çi dikir, min jê re behsa Rindiyan kk. Wî jî li ser Rindiyan tu tişt nizanîbii. Lê wî, ji mêj ve, çend helbestên hozanê Tkk Yahya Kemal xwendibûn û di nav helbestan de bi navê Mirina Rmcf/" helbestek jî hebû. Wê gavê, dema heva-lê min ev helbest xwendibû, tu tişt jê fahm nekirîbû.
Ev yeka ji bi min tiştekî nû bii. Ez dîsan vejîyam. Hêvî dîsan keliyan. Hema min xwe gîhand helbesta Yahya Ke-mal. Min helbest peyda kir. Belê, ew li ser Rindiyan bii. Ho-zan, bi hostetî, behsa mirina Rindiyekî dikir. Niha li ber min, lî ser Rindiyan tiştekî bi rîi hebû û hêviyên min dîsan vejiyabûn. Di helbestê de li ser Rindiyan tu agahî tunebû. Lê, meriv dikaribii, li gor rêzên helbestê, cimle û gotînên wê, tiştine li ser Rindiyan bicivanda. Herweha meriv diviya li an-sîklopedî û ferhengan jî bibinêriya.
Lê belê, ev xebata min jî tu havil nedan. Hêviyên min dî-san çilmîsîn. Xebata min tu ronahî nereşand ser mesela Rîn-diyan. Tiştên ku di helbestê de hatibûn gotin, weke xwe man. Ango ez bi alîkariya wan negîhîştin derekî. Weke niha tê bîra mîn, ez dî wan rojan de pir nerehet, tengizî û bîhn-
81
teng bûm. Min çi dikk nedîkk - ji çend peyvên ferhengekê pê ve - mesela Rîndîyan dernediket rohaniyê.
Mîn bawer nedikk ku kalo bê sebeb behsa Rîndîyan kiri-bû. Çima wî dê - gava ku ez ji gund derdîketim - bê sebeb li ser Rindîyan tiştîne bigotina? Na, ew ne bê sebeb bû. Kalo î-lam dixwest tiştine bîbêje. Lê çî?.. Wîdixwest bibêje ku ew Rindî bû? Baş e, hingê Rindî kî bûn, çi dîkkin?
Mîn nedîzanîbii ka min dê çi bîkka. Imkanên min kêm bûn. Jî alîkî ve, ez li hember zehmetî û dîjwariyên welatê

nîi dîlebitîm û ji alîkî ve jî, min xwe dîêşand ku ez welatê xwe û tiştên ku min li pey xwe berdabûn, ji bîr nekîm, - da ku ez dî labîrentên, yanê xaçerîyên tev lî hev yên skgiiniyê de winda nebim. Min her li gula xwe ya sor ku li ser dîwêr bii, dinihêrî. Min lî wê dînîhêrî û jê dipksî ka min dê - kengê - xwe rabîgîhanda Rindiyan. Min jî xwe û gula xwe re weha dîgot; «ez wan zimanên ku dî vî warê de dikarin alîkarîya min bîkin, nizanim... Ez bi hêsanî nîkarîm ji vî derê derkevim û herîm bîkevim pey mesela Rindîyan... Ez dê çawan bîkim?...»

Lê rojek tiştekî wîsan qewimî ku êdî ne bêhêvîtî û ne jî xem û keser man. Rojekê, serê sîbê dî nav gksa postê de namekê jî xuya kir. Ev nama ku min qet nedipa, dîsan ez kêfxweş kkim. Name ji Tehranê dihat. Kesê ku name şandibii, hozanekî Kurd bû. Ew gelek kal bû û ji zîi ve bû ku ew çiibii lî Tehranê bî cîh bûbû. Min navê wî bîhîstîbû, lê mîn ew weke şexîs nedinasî. Hozan jî hevalekî min ku çiibû Tehranê, bîhîstibii ku ez li pey mesela Rindiyan îm. Wî ji hevalê min navnîşana min wergktîbii û ji min re nama han nivisîbii. Name bî awakî pir germ hatibû nivîsîn û hozan tê de bersîva pkanîya pksên min dîda. Bi vî awayî Rîndî û mesela wan jî

82

derdiket ronahiyê. Hozan, di dawîya nama xwe de, weha digot; «Hevalê hêja Serdar... aha Rindî mîrovên weha ne...»

Nama hozan ez ji derdekî mezîn rizgar kirim. Rewş niha hîn ronîtk bii. Hozan di nama xwe de behsa edet, tore îi şexsiyeta Rindîyan dikk. Piraniya van tiştan - biawakîberbiçav - li nik kalo jî hebûn. Belê, niha baş dîxuya ku kalo bê sebeb behsa Rindiyan nekiribû. Kalo diviya Rindibûya...

(Kalê rind, piştî keft û left û xebateke nehêsan, min ew dîwarê nexuyayî ku di navbera me de bii, hilweşand. Belê, min ew dîwar hilweşand û pêlên besttijî ku li pey çavên te yên kor bûn, dîtin. Hîngê min rehet kk. Ez baş tênedîgihîş-

tim, lê tîştê ku min ji te, ji Rindî)şan, ji Rindîtiyê, jî rabûn îi rîinîştina te û ji edet û torên Rindiyan fahm kk, ev bû: Ji jiyanê hezkkin, daxwazî, dîlgeşî, dUgermî, dilovanî û best îi evîn ji bo jiyanê... Dema min ev yek fahm kir, hingê meraqa min jî daket. Meraq... Kêfa te ji meraqkirinê re jî nedihat. Te - bi çavên xwe yên kor - bi tenê dixwest hîs bîkî û bêdeng riinî. Hîskkin û - bê ku tu meraq bikî - bêdeng rîiniştin... Te digot, «însan divê xwe ji hinek tişt û hîsên ku li ba însanan hene, bifilkîne.» Lê ez divê bibêjim, min nikarîbû xwe ji van tiştan rizgar bikka. Ez divê li xwe mikur werim; min meraq kk, min pir meraq kk. Çkîiskên meraqê di mêjiyê min de pêketin.
U piştî ku ez fêr bûm ka tu kî biiyî, êdî bîhn li min vebii, min pir rehet kk...
Piştî namê, dotira şevê, ez baş raziyam. Ez wê şevê ketkn nav xewnên kiir û di nav xewnan de çûm, çûm, çûm... Gava ez di nav xewnan de pê re çûm, çîvîkeke nas ii biçûk ji xewnên min veqetiya û hat li kêleka pencera oda
83
mîn ya razanê venişt... Pencere vekirî bû. Min çivîk dinasî, lê nedîhat bîra min ka ez wê ji kii dinasîm. Çavên wê dîbîriqîn. Çivîk demeke direj li min nihêrî û bi dengê xwe yê zirav vîçe vîç kk. Weke ku wê dîxwest ji min re tiştekîbibêje. Mîn jî li çav, nîkul û baskên wê nîhêrîn. Nikula wê her dîiebîtî û baskên wê yên reş û spî jî - wekî çavên wê - dîbiriqîn. Bi dii re wê xwe berda bexçê xênî. Bexçe rengîn bû, kulîlk nii dibişkîvîn û gulên ku nii zîl dabûn, dixwestin hilbîkîşîn ser dîwaran. Çivîk, - weke ku ew li pey tiştekîbe - çend car li ser bexçê rengîn fkiya. Di pişt re wê xwe berda cîhê gulan û di nav gulan de winda bii. Ew pir bi lez fkiyabû û di hîlmekê de çûbii nav gulan. Gulan ew wergktibii û di nav xwe de veşartibii. Min bîskekê jî pencerê li bexçê nîhêrî. Lê ew hew dixuya. Min wisan bawer kir ku ew wînda bii. Gava

mîn xwest ku ez ji pencerê bi şîin de vegerim û herim ser cî-
hê xwe, hingê çivîk ji nişka ve ji nav gulan derket û ber bi
asmên bi fkê ket. Niha di nav nikulên wê de guleke nîibişki-
vî hebû. Ew, gul di dêv de, bi qasî çendekê li ber pencera
min fîriya.
Gava min xwe ji pencerê xwar kir ku
ez lê bînîhêrim, du dilop av çilkîyan ser rîiyê min. Ev du dîlop av
bîhna gulê ragîhand min. Bîhna gula xweşîk ez kêfxweş kkim.
Çivîk - îcar - ber bi jor bû û paşê ber bi
aliyê din yê xênî bii. Xanî li ser perava deryakê bû û ev aliyê pêşî yê xênî
H ser deryayê, li kêleka wê bii. Ez ber bi aliyê din yê malê
beziyam da ku min bikaribûya dîsan ew bidîta. Ew her ber
bî jor dibii. Lê wisan dixuya ku ew şaş bûbû; ew di deverên
xerîb de bû. Dema ew ji xênî bi dûr ket û hat ser deryayê,
ew di cîhê xwe de rawestiya. Baskên wê dilivîyan, lê ew ber
bî tu derî nedîfkîya. Ew bîskekê lî ser deryayê rawestîya - ii
84
bi dîi re
- ber bi avê daket.
Ew her û her daket. Derya pêldayî bii. Pêlên deryayê li pey hev heta
qeraxa deryayê dihatîn. Ronahiya heyvê weke xêzeke zirav li ser avê dibkiqî
Çivîka reben nedizanîbii çi bike. Ew bîskekê - pir nîzm - li
ser avê firiya. Dema wê pêlên deryayê dîtin, ew ber bi pêlan
fkiya. Niha bala wê li ser pêlan bû. Pêl di cîhekî deryayê de
ku ji qeraxê pir bi dûr bii, pêk dihatin. Ew pêlên geşbûyîdi
qeraxa deryayê de winda dibiln. Lê pêl, herweha - bêdawî -
dom dikkin û li pey hev dihatin. Pêlek li qeraxê wînda dibii
ii li pey wê yeka nû dîhat. Pêlek winda dibû û yeka nîi
dihat... yek winda dibû û bi dii re yeka nû dihat... Ev tişt
her weha dom dikir. Ev lebata pêlan di dîlê merivan de pêlên
tirsê vedidan. Meriv jê xof digkt. Qiimên reben... Ew çawan
li hember vê erîşê radîwestiyan?

Icar, pêl, heyv, ronahiya heyvê û xêza ronî ku li ser avê dixuya jî, bi hev re, xweşiyên tebîetê nîşan didan. Dema pêl dihatin ser xêza ronî, ew - demeke pk, pir kurt - dibkîqîn ii jê derbaz dibûn û diçûn. Ew gava ku pêl dibiriqîn, gaveke ecêb xweş bû.
Hunermend ii wênekêşên hoste diviya ev
dema kurt bidîta. Ji lewre di wê dema kurt de pêlên spîbi heyvê re dan û standineke bêdeng pêk dianîn. Dî nav wê xêza ronî de baş dixuya ku pêl jî ne wekhev bûn. Ji dîir ve, gava merîv baş bala xwe nedidayê, meriv bawer dikir ku pêl her mîna hev bûn. Xêza ronî nîşan dida ku na ne wisan bii. Hinek pêl di nav xêzê de geşbûyî û hînek jî weke nûpêkhatî dîxuyan. Pêl wekhev dixuyan, lê ew di esasê xwe de bi ferq bûn.
Çîvîka biçûk - demeke dkêj - baskên xwe çkpe çkp kir îi
H pêlan nîhêrî. Bî dii re, wê tiştekî ecêb kk; ew firiya û çû cîhê ku pêl pêk dîhatm û jî wê derê, tevî pêleke niipêkhatî.
85
heta qeraxa deryayê hat. Gava pêla ku ew pê re dîhat, li ser qiimê vwnda bû, ew dîsan bi şiin de, ber bi deryayê fkîya. Wê lî wê derê, lî cîhê ku pêl pêk dîhatîn, ji xwe re pêleke nii hîlçand û pê re dîsan heta qeraxê hat. Ew çend car weha ber bî paş û pêş fkîya. Wê dît ka pêl çawan dîzên û dîmirin. Baş dixuya ku wê ev lîstika ecêb ya pêlan pir meraq dikk. Wê baş fahm nedikir ka çi diqewimî.
Paşê jî ew çii û li ser xêza ronî rawestîya. Heyv lî wê derê, lî ser avê dibkîqî. Edî wê ne pêl temaşe dîkirin û ne jîber bi cîhekî difirîya. Wê baskên xwe çkpe çkp dîkirin û li xêza ronî dinîhêrî. Wê demeke dkêj - belê, demeke gelek dirêj - li wekhevî û cudatiya pêlên ku xêza ronî dibihurîn, nihêrîn. Paşê, wê xwe bi carekê, ber bi jêr, ber bi sînga deryayê berda. Min ev yek jî nedipa; çîvîka biçûk xwe lî ser wê xêzê berdabii avê... xwe noqî avê kkibii...

Çima wê weha kkibû? Ez hê li ser vê yekê difikirîm, ew dîsan derket ser avê. Gul hê jî di dêv de bû. Çivîk û gul niha dibîrîqîn. Wê dîsan demeke dkêj li pêlan û xêza ronî nihêrîn îi çend car baskên xwe çkpandin. Bi dîi re jî, ew dîsan ber bi min bî firê ket. Ew niha rehet dîxuya. Ew bi ser serê min re derbas bû, aliyê pêş yê xênî lî pey xwe berda û dîsan hat bexçê.

Ez dîsan ber bi oda razanê beziyam îi çûm ber pencera vekkî. Wê demeke kurt li hawê zîk-zak çêkirin ii çend car heta ber pencerê hat û li min nihêrî. Paşê, ew ber bi alîyê gulan daket û di nav gulan de winda bû. Ez demeke dkêj li hêviya wê mam. Lê êdî ew nedixuya.

Çivîka biçûk dî nav gulan de wînda bii...)

Piştî salekê, rojeke zîihatî ya biharê, ez dîsan ber bî de-verên kalo çûm. Çiiyîna min ya vê carê hêsantk bû. Rê vekî-

86

rî û çûyin û hatin hêsan bû. Dema ez rojekê, ber bi dana êvarê gîhîştim gund, min kalo di bin wê darê de dît. Ew lî bin darê rûniştibû. Bihar wê salê zû hatibû û ax avis bû. Ji axê bîhneke xweş radibû. Kalo li wê derê rûniştîbû û H bOiirê dixist. Ma daxwaza dîlê min jî ne ew bû ku min kalo weha bidîta!..

Ez - îcar - bi tenê, bi serê xwe hatîm gund û hê haya wî tunebii ku ez gihîştibûm gund. Hingê, dema ez gihîştim gund, ez di nav hîsên perçebûyî de bûm; hîsên bajarê mezîn, ew lez û beziya jiyanê ya bajêr, tev li hevî û trafîga bajêr îi sakînî û bêdengiya gund... Ez, bi hîsên xwe yên têkel û per-çebiiyî, li dîirê kalo rawestiyam. Min car bi car bîhna axa mubarek gîrt û da, girt û da... û min li bilûra kalo guhdarî

1. Dengê bilûrê dîsan perde perde fireh dibû. Ew deng dîsan melûl, dUovan, dilsoj û bi keser bû. Dengê nermik îi xweşîk weke poşîkekê, dixwest hawirdor vegke, weke ku wê dîxwest jana axa avis kêmtk bike. Ev gund, ev cîhê bêdeng

çiqas cihê bû!.. Ev cîh qet bi ew bajarê mezin, warê min yê skgîiniyê nedima.
Ev kalê ha qet bi wan merîvên bajarê
mezin nedima. .
Wisan dixuya ku kalo, bi bilûra xwe ya delal, li vê derê dî nav bextiyariyek de bii. Ew serfiraz dîjiya' Wî tîştên zêde nedixwestin. Ew ji tiştên zêde direviya û bi vê yekê bextiyar ij serfkaz dibii. Bextiyarî, serfirazî, kêfxweşî... ev tîştên ku her kes lî pey bûn, lê tu kesî nedikaribii bîdîtma, tu kesî nedikaribû bianîyana zimên, li vê derê, li nik kalo bûn. Ew bî awakî tahzî, xwasî, serqot û sade li nik kalo bûn. Wan lî bin darê, li gor dengê bilûra kalo govend gktibûn!..
Ez, bêdeng, çûm nik wî. Lê ew ewçend ji xwe bihurîbii ku ew qet pênehesîya ku ez hatîbûm nik wî. Min bi dengekî
87
gelek nîzm sîlav dayê. Ew - weke ku vecinîqe - hejiya û serê xwe ber bi jor ragkt û bi dii re, bîşkî. Wî ez, ji dengê min nasîbûm. Niha baş dîxuya ku ew kêfxweş biibû. Wî, ken li rû, silava min wergirt û ji min re got:
- Te gundê me kir riya avê, tu hê do li vê derê biiyî... naxwe tu jî dixwazîli gund bi cîh bibî?
Min - weke ku tiştekî gelek gkîng keşf kiribe - hema jê re got:
- Tu
dibîni...
tu
dibêjî
«tu jî».
Ev yeka jî nîşan dide
ku tu paşê, di pişt re, hatiye û li gund bi cîh biiye.
- Hele bîsekine, hele bisekine, bîhn li me meçikîne, wî got. Tu hê nû hatî. Hele bîhna xwe bigke... Çawan, bîhna axa xubar, giya û kulîlkên ku dibîşkivin, tên te? Ez ji te re

bibêjîm, ev bîhna xweşîk jî her kesî re nesîb nabe. Baş bîhn bîke... Ev bîhn, çi bîhneke xweş e!.. Çavên min nabînin, lê ez pir baş pê dîhesim ka tebîet çawan jî nû ve vedije. Ez vê yekê dijîm. Tu dîzanî, jî axê xweştk, rindtk û miqedestk tu tîşt tune. Ez pir jê hez dikim... ez ji axa mader û tiştên ku jê dîzên,
pîr hez dikîm.
Belê,
dîsan wext, wexta hişînbûna
xweşiyan e. Wext dîsan avis e. Wext, dîsan wexta li bin darê rûniştînê ye...
Ew bîskekê din jî li ser tebîetê û xweşiyên wê peyivî îi paşê, ji min re got:
- Şîvan pez bkin çêrê. Ew hê venegeriyaye. Bi qasîku ez têgihîştim, çante jî bi te re ne. Tu bi xwe dîkarî wan hildî îi H jiirê min yan jî li jîirê şîvên daînî. û gava tu derî hun-
dk, çayek jî daînî ser êgk.
Mîn çanteyên xwe hîlgktin û ez çûm oda şivên. Deriyê o-
da şîvên weke her carî vekkî bû. Wîsan dixuya ku şivên qet derîyê xwe nedigkt. Ode her weke xwe bii, tê de tu guhertîn
88
nedixuya. Min çay danî ser kuçîka gazê. Piştî bîskekê, ez, tevî çay, qedeh, kevçî û şekk li ser siniyekê, vegeriyam û ha-
tîm nik kalo. Gava ez rûniştim, min şivan jê pirsî.
- Ew baş e, kalo got. Siheta wî di dewsê de ye. Ew divê niha were. Rast, ew deverên ku tu jê têyî, çawan în?
- Zivistan e, min got. Ax - li wê derê - di bin poşikeke stîir nerm û spî de lal û bêden razayî ye... Meriv di nav palto û cilên xwe yên germ de, bi lez û bez ber bi cîhên germ dire-
vin. Ba û bager hê jî kena riiyê merivan dicemidîne.
- Hingê baş e ku em li wir najîn, wî bi kurtebîrî got.
Kincên li ser kalo niha hîn çêtk bûn. Wî - herhal - bî besta hatina biharê,

xwe
nîi kiribû. Kiraseke spî, êlegeke reş ii
pantoleke nii, fkeh il xêzkkî li ser bûn. Ew niha hîn kaltk
dixuya. Digel vê hindê, min jê re got ku ew baş dixuya.
- Ez hêvî dikim ku wisan be... û herhal wisan e ku ez hê jî
dijîm, weke ku min li vê dinê kon vegktibe. Ez her roj mki-
na yek, du nasên xwe dibihîsîm. Lê tu tişt bi min nabe. Wi-
san dixuye ku melayika mirinê, yanê ruhistîn sond xwariye
ku ew heta hemû heval, dost û nasên min nebe gorê, ber bi
min neyê. Ew divê, di mirina her nasekî min de, min careke
din bikuje û paşê were cem min...
Di wê navberê de, Kalo got ku wî bihîstibli ku ez dê biha-
tima. Wî ev yek ne ji melayikên xwe, lê belê ji şîvên bîhîs-
tibû. Şivên jî, li bajêr, ji hinekan bihîstibû.
- Belê, aha ez hatim, min got.
U bî dîi bîskekê re, min xwest ku ez jê re tîştekî bîxwî-
nim.
- Tu dê ji min re çi bixwînî? wî pksî.
- Namekê, min gotê û min bi lez jî bêrîka xwe nama ku ji
Tehranê hatîbû, derxîst.
89
- Nama kê ye, çî ye?
- Ev name ji min re hatîbû. Dî namê de behsa hinek kesan
dîbe. Min dixwest vê namê jî te re bîxwînim da ku bîbînim
ka tu kesên ku di namê de bi nav dibin, dinasî yan na.
- Çî ye, tu dixwazî min îmtîhan bîkî? wî pksî.
Lê min wext tunebii ku min bersîva wî bida. Min hema
dest bî xwendîna namê kir:
«... Belê, Serdarê bka... Ew û edet û torên wan perçekî e-
sasî yê çanda Rohelata Navîn e, - nemaze yê Kurdan û bi dii
re, yê Fars û Osmaniyan. Di Rohilata Navîn de tesîra vê e-
det û toreyê pir mezin biiye. Gelek mirov, şaîr, nivîsevan di
bin tesîra vê edet û toreyê de mane. Bi alîkariya vê edet ii

toreyê mirov, mîrovahî û dinya hîn çêtk hatine zimên û herweha hatine hîskirin. Bi qasî ku tê zanîn, ev mkovên zane; şareza, şên, nefsbiçûk, evîndarên jin û vexwarinê, nedîndar, dilgeş, zarşîrin, qiserast û jîr bûne. Di şiîrên kevn yên Kurd, Fars û Osmaniyan de jî ew wekîkesên xurt, rast, bîhnfkeh, hezkarên mkov û mirovahiyê, xwedanşefqat, comerd, nefstêr û serbest tên taswîrkkin. Li gor danezanan, edet û toreyên wan xwe digihîne Qeyser Cemşîd ku di mîtolojiya Kurd ii Fars de cîhekî girîng werdigke. Reh û rêçeyên wan ji Keysar Cemşîd û xurtî û rindîxwaziya wî tên. Cemşîd jî evîndarê mirov û tebîetê bû û cara pêşfn wî şerabên yaqiitîpeyda kîribû. Cemşîd alîkarî kir ku edet û toreyekê weha were pê. Bi kurtebkî, ew ji jiyanê û jiyînê hez dikîn û hêvî dîkin ku bîla mirov û dinya kêfxweş bextiyar û serfkaz be. Lê mirov nikare bibêje ku nêrîna wan ya li ser dînyayê hêvîtîjî ye. Ew pêşveçûna dînyayê baş nabînîn...»

Lî vê derê min serê xwe ji namê ragkt û jê pîrsî:

- Ez bidomînim?

90

- Belê, dewam bike, wî got. Nama te bala min kişand.

Min qultek ji çaya xwe vexwar û xwendina xwe domand.

«Ew tu carî ji rewş û zkiifê dinyayê memnîin nebûn. Ew hê jî ne memniin in. (Tebîî, eger ew hê jî hebin û dijîbîn.) Bîr û baweriyên wan gelek balkêş in. Ew dibêjin ku emk, şert û şiirt û fermanên ku ji aliyê dewlet, dîn û karmendên ciirbecûr pêk tên, rê li pêşketîna mirov û mirovahiyê dîgîrîn îi ew qeyd û şert bernadin mkov serfkaz û dilpak bin. Herweha ew li dijî qedexe û sînorên civatê ne jî.

Di dawiya dawîn de mirov dîkare bibêje ku ew û edet ii toreyên wan ji nav jiyanê dertên û bi dan û standinên civakî ii bîr û baweriyên mirovahiyê ve dikemîlin. Hêja ye ku mirov wan weke bîrewer û fOîsofan bibînin. Ji lewre nêrînên wan yên li ser jiyanê û dinyayê hem pir fkeh û hem jî pk

kiir in...»
Li vê derê namê, ez dîsan rawestîm. Min cimle, bi lez, H pey hev xwendibûn. Bîhn li min çîkiyabii. Ew, serî lî ber, dibişkî û hêdî hêdî bi bilûra xwe dilîst. Gava min xwest ku ez dîsan dest bi xwendinê bikim, wî ji min pirsî:
- De baş e, ev kî ne, çi kes in?
- Jixwe
min
dê jî eynî ev tişt ji te bipirsiya, min got.
Gelo ev kî ne?
Min hê xeberdana xwe neqedandibii, ku ji dûr ve şivan xuyabii. Edî nedibû ku min name bixwenda. Ez, ji alîkî ve, H ber vê yekê ketim, lê ji alîkî ve jî kêfxweş biibûm; şivan dihat. Ez rabûm ser piyan û ber bi şivên çûm. Me hevûdu hembêz kk.
Wê şevê li mala kalo şênahiyeke ecêb xweş hebû. Em heta nîvê şevê li nik kalo rûniştin, em bi hev re peyivîn û me guh da bilûra kalo. pir kes li odê bûn. Ji min pê ve, kalo, şîvan û.
91
pênc gundiyên dki jî lî wê derê bûn. berê jî min sisê ji gundiyan dîtibûn. Ode bi best û kêfxweşiyê dîhejiya. Gundiyan henekî dikirin û em didan kenandîn. «Tiirikên» wan tijî mesele û çîrok bûn. Herweha ew kêfxweş bûn ku bihar zii hatîbii.
Ez jî kêfxweş bûm. Ez lî nik gundiyan bûm û min li wan guhdarî
dîkk.
Vê
yekê
ez
kêfxweş
dîkkim.
Çavên wan

dikenîyan. Wan lî gor edetên xwe hereket dikirin, bi dest dîpeyivîn û hewce nedidîtîn ku bî awakîderewîn xwe cihê - bi awakî din - nîşan bidin. Ew ji çîkosiyê jî bi dûr dixuyan. Di destpêka wê şeva xweş û şên de, min ji gundiyê ku li nik min rûniştibii, re got:
- Hiin pir kêfxweş dixuyin.
- Bkayo Serdar... çima em kêfxweş nebin? wî got. Ji bo ku em kêfxweş bibîn, her tîşt li vk heye. Şikur ji Xwedê re; ard, şekk, xwê, mast û şîrê me heye. Herweha me îsal kezeb jî li şeytên pkitand. Isal hawe pir baş e, rewşa pêz û dewêr baş e. Eger Xwedê me ji tofanan star bike, zevî jî dê baş werîn... edî em ji Xwedê çi bixwazin? Em dê îsal her kêf-xweş bîn.
Lê, ev şênahî, ev kêfxweşî, evjîndarîqet nedişibii rebenî ii bêdengiya gund.
- Lê, min got, gava meriv ji der ve li gund dinihêre, ew pir xkbe, bêdeng û weke ku terkkirî be, dixuye. Weke ku qet jiyan ber bî van deran nehatibe...
Gundiyekî din - îcar - bersîva min da:
- Naxêr, ne wisan e. Ji alîkî ve tu rast dibêjî, gotina te ye, lê ji alîkî ve jî ne li gor gotîna te ye. Eger tu feqîrîyê bipirsî, jixwe ew di siûda me de heye, di eniya me de «feqîr» hatiye nîvîsîn. Em feqîr hatin dinê û em dê feqîr jî herin. Ev rast
92
e... em fiqare ne. Lê... ez li ser xwe bibêjim, digei vê teqîriyê jî, ez bala xwe didim tiştekî; dewlemendiya dîl. Deriyê min ji her kesî re vekkî ye, her kes dikare were û li ser sifra mîn ya fiqare rîine. û eger tiştekî ji destê min were, ez wî texsîr jî nakim, ez dixwazim wî jî bikim. Belê, ji bo her kesî jî bikim. Keys û îmkanên me tune ku em gundê xwe xweşiktir bîkin. Lê ma eni nikarin bi nefsa xwe jî?
Em li ser mînderên tenişta dîwaran rûniştibûn. Em hem dipeyivîn û hem jî tiştên ku gundîyan sinî bi sinî anîbûn,

dixwarin.
Li ser siniyan her texlîd fekî û xwarin hebûn.
Kalo kêfxweş dixuya. Ew zêde nedipeyivî, bi tenê carina «belê... wa?.. na lo!.. wisan e... errr...» digot. Gundiyan - carîna - ji siniyan tiştine digktin û didan wî. Wîjî bi kêf tîşt werdigktin û dixwarin. û wî qet ji bîr jî nedîkk ku her car spasê gundiyan bilce. Carek, dema êdî şev bûbû dereng, wî ji me re got:
- Hîin gelek peyivîn, de bisekinin, ez ji we re hinek li bilûrê xim.
Ji min bêtk gundî bi vê yekê kêfxweş bûn. Wan hema dest bi çepikan kirin.
Cara yekemîn, min wê şevê dît ku kalo dikare bi awakî din jî li bilûrê bixe; dengê bîlûrê niha kêf,' henek û şênahî dkeşand. Niha di şiina ew dengê zîz, dilovan û keserkûr de, dengekî şên hebû. Kalo çavên xwe girtibûn û hêdî hêdî bilûra xwe puf dikk. Dest û ew tiliyên zirav dîsan bi hostetî li ser bilûrê digeriyan. TUî bi dîizan û bi rêk û pekî qulên bilûrê didîtîn û bî rehetî li ser qulan radibûn û dadiketin. Ev yek, ewçend bi dûzan dibû ku min jî dikarîbû bîdîta. Carina jî tUiyekî li ser eynî qulê çend car radibii û dadiket. Kalo her bî ken bii. Bî her awayî dixuya ku wî bî kêf, best û
93
dîlovanî bilûra xwe puf dîkk.
Icar gundî jî di nav kêf û şênahiyeke nedîtî de bûn.
Musîka
ku ji bilûrê derdîket û ode tijî dikîr, ruhê wan dîhejand. Wan stran û dîlanên ku kalo lê dixistin, dizanîbûn ii pkaniya caran bî dengê bilûrê re geş dibûn û dîstran. Gava ew nedîstran, hingê wan li çepîkan dixistin û hewa odê geş dikk. Carîna jî wan kalo geş dikk û bi dengekî berz dîgotîn; «bijî, tu her bîjî...»
Piştî ku me ew şev weha bi kêf û henek bîhurand, me

kalo li oda wî bi tenê berda û em jê veqetîn. Ez jî bi şivên re çûm, - ez dê dîsan li nik wî bimama.
Dotka rojê, gava ez hişyar bûm, şivan ne li mal bû. Ji zii ve bû ku ew rabûbû û çûbii ber pêz. Lê wî - berî ku here - ji bo min tahştê hazk kkibû û danîbii ser siniyekê. Min jî, bê ku ez bUezînim, hêdî hêdî ji xwe re çayek çêkk û pê re tahştiya xwe xwar. Bi dii tahştê re, ez derketîm ber derî. Gava ez derketîm derve, tîrêjên tavê çavên min gktîn. Şewqa rojê hawirdor gktibii û ew bi awakî pir xweş lî ser giyan dîbkiqî. Hawirdor bêdeng bû. Xaniyên gund - ji min hînekî bi dûr - li pêşiya min bûn. Çend zarok li ser banekê dUîstin. Jinikek jî li ser kahniyê sitîlên xwe tijî av dîkirîn. Ev jinîk, jina yekemîn bû ku min li gund didît. Gava jinikê ezjidîir ve dîtim, wê bi awakî şaşbiiyî li min nîhêrî û bi ken serê xwe hêjand û sîlav da min û pê re wê dolbenda serê xwe rast kk û serê xwe zivkand.
Dema min kahnî û ava ku xwişe xwiş dîkk, dît, best li min rabii; min xwest xwe bîşom. Ez dîsan vegeriyam hundk ii min sabîîn û destmaleke dkêj ji çentê derxistîn. Gava ez dîsan derketim ber derî, jinik jî, tevî sitîlên xwe, ber bi xanîyan dibezîya. Ez çûm ser kahnîyê û min serê xwe daxîst
94
bin ava sar. Mîn, demeke dkêj, bi sabûnê serê xwe şuşt. Dî pişt re jî, ez hatîm û li kêleka dîwarê xaniyê şivan li ser totikan rûniştim. Min xwe niha rehet, pir rehet hîs dikk. Min çavên xwe gktin û serê xwe ber bi tavê zivîrand. Berî çend rojan, ez ji tav û germiya wê pir bi dûr bûm, lê niha ew H nik min bû, - yan jî ez hatîbûm nik wê.
Ez wisan, li wê derê, di xew re çûm. Ez nizanim ka çiqas ez di xcw de mam, lê gava dengê deriyekê hat guhê min, ez dîsan hişyar bûm. Kalo bû. Ew derketibû ber derî û destekî wî hê li ser derî, dixwest dengê çarmedorên xwe têbigîhê. Ez hema rabûm û ber bi wî çûm.

- Ha... tu yî, wî got. Çawan, tu baş raketî?
- Belê, min got, ez rehet razam... min baş xew kîr. Ev bû bîskekê jî ez li bin dîwêr rûniştî me. Min, weke kesên ku nîi tav dîtibîn, eynî wisan, xwe da ber tîrejên tavê.
- Baş e, tu çima nehatî ba min? wî pirsî. Ez jî, jî zîi ve ye ku hişyar bûbûm... Heye ku tu jî dîzanî... ez serê siban gelek esebî me.
Naxêr, min got, min nexwest ku ez werkn û we ecîz
-
bikim.
Wê sibê min alîkariya wî kir. Em bi hev re çûn bîn darê. Min ji oda wî kulavek, bahlîfek û du mînHer anîn û ew H bin darê raxistin. Min alîkariya wî kir ku ew rîine. Paşê jî min jê re çayek çêkir. Wî tahştê nedikir. Wî qîma xwe bî perçekî nan dianî.
Gava min çay tijî kkin, wî ji min pksî:
- Rast, dostê te çawan e? Min bihîst ku ew hatiye gîrtin ii niha li hepisxanê ye. Gelo ev rast e?
- Mixabin, min got, xeber rast e. Ew niha li gktîxanê ye. Rewş jî niha - lî gor par, pêrar - pir xîrab e. Ez pir lî ber wî
95
dikevim û wî meraq dîkîm.
- Heyf... wî got, pîr heyf. Ez jî wî gelek meraq dîkim. Ew xortekî pir jîr, çeleng û rind bû. Inşallah tu tîşt pê nabe... înşallah ez dê xebera mirin yan jî kuştina wî seh nekim.
(Wext diherike, kalê rind, wext diherike. Wext li me di-qulibe... Li hember herîkandina wextê em nikarin tu tiştîjî bikîn... û wext me jî bî xwe re werdîgke û dibe û dibe û di-be...
Ax... me bîkarîbûya ev wexta maUcambax carek, bi tenê carek rawestanda!
Me
bikaribûya kêfxweşî û serfkaziyên

xwe, ew
demên kurt yên bextiyarî û xweşiyê tim û tim
vejandina!
Ne bî tenê kêfxweşî û serfkaziyên xwe, ne bi
tenê bextiyarî û dUgermiyên xwe, herweha me bîkaribûya
kul,jan û qahrên xwe jîtim û tim hîs bikirina, me wanjibîr
nekkîna! Me bîkarîbûya di berbanga her sîbê de dilên xwe
bidana bin gîrane îl zompên qahr, jan û êşan! Me her gav
bizanibûya ka em çima kêfxweş in û em çima keserkiir in!
Lê na, na, na... wext dê were iî
perda jibîrkîrinê li ser serê
me re bigke... Em dê di bin perda jibîrkirinê de binivîn... Ma
ev ne neheqî ye? Çima wext dê li me nifkan bike û me bi
kkasê reş, yanê bi perda jibîrkkinê ceza bike? Çima em dê
her gav, her tiştî jî bîr bikin? Çima? Çima? Çima?
Hechecîka bîçiik... ew hechecika biçûk divê were bîra te...
Min ew jî ji bîr kkibii. Ew jî li pey mij û dîimana çend salan
mabû. Min xwe êşand da ku ez bikaribim perda jîbîrkirinê
biqelişînîm
ii hechecîka biçûk ji pey mîj û dîimana salan
werînîm. Min xwe pir êşand ku ez bikaribim wê bi bîr bînim
îi
bi peyvên îroj ku bi dengê
«E» ve tijî ne, binivîsînim.
Weranîna wê ne hêsan bû. Min li dijî wext şer kir.
96
U dî dawiya dawîn de, bî awakî gelek gktî, gelek tarî hat
bîra min ku gava min ew - dîsan - dît, min çenta xwe ya bi-
çûk ya dibistanê ber bi jor, ber bi asmên pengizand. Ez jî di-
bîstanê dîhatim û hew lî hêviya hechecika bîçiik bûm. Mîn
hew hêvî hebû ku ew dê bihata. Lê ew hatîbû... Yanjîhec-
hecikeke din ku weke wê bû, hatibû... Ez bi xwe nedikarî-
bûm bi firê ketima û ji ber vê yekê jî, min çente bî fkê xist.

Belê; hechecik dîsan hatibû û ez di nav dîlşahî û kêfxweşî-
yeke ecêb û nedîtî de bûm. Hingê, gava ew di ser serê min re
difiriya, ez kêfxweşiyeke paqij, germ, yekta û zelal ku meriv
nikare bi peyvan bîne zîmên, dijiyam.
Wê havînê em, ez û hechecikê her bi hev re bûn û ji bo ku
ez pê re bim, ez û kalikê xwe wê havînê neçûn zozanan jî.
Ew jî, bi ew awir û hereketên xwe yên nas, her li dor min
difurîya. Hevaltiya me - bi wext - ewçend bi pêş ve ket ku wê
dest pê kir û hat ji lepên min av vexwar. Dema min li wê dî-
nihêrî, ez dUşa dibûm. Ew, bi rengên xwe yên reş û spî, we-
ke melayUceke hiir dixuya. Ew ewçend biçûk, ewçend bêça-
re û ewçend belengaz dixuya ku pkaniya caran kêfxweşiya
min bi keser û xeman tev li hev dibii. Ez ji alîkî ve kêf-
xweş û ji alîkî ve jî xemgîr dibûni. Min dixwest hem wê bî-
parêzim û hem jî jê hez bUcim. Weke kii wê ev yek fahm
kkibe, wê jî çavên xwe yên hîir digirtin û vedîkkîn, baskên
xwe diçkpandin û qeşmerî dUckin.
Lê li pey kêfxweşiya min ya nedîtî, guman û xem jî he-
bûn; ber bi payizê, dema dibistan dîsan vebûna, hechecUc dê
dîsan ber bi deverên germ bifkiya. Wê dê ez terk bikîrama.
Roj bi roj
ev guman û xem bûn zêde. Wexta dîbistanan
dUiat.
Kîncên
nîi,
pêlavên
nîi, defter,
qelem
îi kîtêbên
nîi hatm kkîn. Min dîxwest ku dîbistan rojeke zîitk ve-
97

1. Mîn bêrî li dibistanê kkibii. Lê min nedixwest ku ev
daxwaza min - berbiçav - bixuye. Weke ku gava min ev da-

xwaza xwe nîşan bida, hingê hechecUc dê winda bûbûya. Ez - bi hîsên xwe yên zaroktiyê - pê dihesiyam ku dema dibistan vebîn,
hechecUc
dê
here...
Vebûna dibistanan, çiiyina
hechecUcê bû jî...
Lê mixabin, pir mixabin ku wisan nebû... Hechecik bi fkê neket û neçii. Tam di destpêka vebûna dibistanan de, rojekê mîn hechecUc li bexçê, li ser ax vegevizî dît. Wê dixwest ii dUebitî ku bifke, lê nedibû. Dema ez bî lez çûm nik wê, mîn rewş
fahm kîr; baskê rast yê hechecîkê şkestibû. Hînekan baskên hechecikê yên jar û tenUc şikandîbûn. Yan jî ew rastî derekî, cîhekî, tîştekî hatibû. Wê meliil meliil li min dînihêrî. Hingê ava germ bi kebokên min de hat. Min hema, bi lez ew gkt û bk nik kalikê xwe. Min lava jê kir û li ber wî geriyam
ku ew hechecUca reben dîsan sax bîke, baskê wê bicebirîne. Kalikê min - pêşî - baskên wê yên bi xwîn paqij kirin, çend pîirtên li dor bkînê riiçîkandîn û paşê jî celebeke merhema reş danî ser bkînê.
HechecUc
hew
difkiya.
Berî ku
ew
bkîndar bibe,
her
roj, wê hevalên xwe, hechecikên din didîtîn û ew bi hev re difiriyan. Lê hechecika reben niha hew dUcaribii bi hevalên xwe re bifue. Kalikê min jê re qefeseke hîir çêkir. Ew niha

dî nav qefesê de, li nik min bû û bi çavên vala li doraliyê
xwe dinîhêrî. Kêfa ku ji çavên wê dixuya, niha winda bûbû.
Dema
hechecUcên dîn dihatîn û lî doraliyê wê dîfîrîn, ew
dîsan dihat ser xwe û jîndar dîbû. Bî tenê hîngê. Dema wan
hevûdu
didîtîn,
vîçe vîçê dest pê dikk. Wan her vîçe vîç
dikirin. Weke ku wê ji wan alîkarî dixwest. Lê ne wan, ne
min û ne jî kalikê min dUcaribii jê re alîkarî bikka.
98
Paşê, rojek di wan rojan de, dema asman ber bi dana êva-
rê bÛ tarî, ez ber bi hechecUce beziyam. Asman bÛbÛ tarî...
ji ber ku dema koçkirine hatibÛ; hechecUc ref bî ref ber bî
deverên germ difiriyan... Min hechecUc ji hundk anî, ji
qefesê derxist û berda bexçê. We, bi best, dest bi vîçe vîçe

1. Wê dixwest bibe pardare vîçe vîça asmên. Weke ku wê jî

bîr kkibÛ ku ew bkîndar bû, we xwe çend car lebîtand ku
bifire. Lê nebû, ew nedUcarîbÛ bi fkc bUceta. Ew dîsan bi eş
ket ser axa sar. Bi dû vê yekê re, wê bêlebat, li jor,Hrefên
hechecUcan fekk. Ew her wisan ma.
Eynî tişt çend roj dewam kk. Her cara ku ez ji dibîstane
vegeriyam, min ew anî bexçê. Her dana evare ewr Û as-
man bû tarî û hechecUc li pey hev fkiyan Û çÛn. HechecUca
bextreş, hechecika siÛdxkab, hechecUca baskşkestî li nUc me

1. Heval û hogkên wê çûn, lê ew ma...

Di wan rojan de, dema min li çaven hechecUcê dinUierîn,
ez kelgkî dibÛm, dUe min diguvişî. Min hew dîxwest ku bUa
ew li nUc me bima. Min dixwest bUa ew biçÛya, bUa ew bîçû-
ya, bUa ew biçÛya, tevî refen hechecUcan biba, dev ji jiyana
xwe ya koçertîye berneda; min dixwest bUa we jî, bUa we
jî, bUa wê jî koç bUcira. Lê wê nedUcaribÛ... Feren çavên we
vemkîbûn, winda bÛbÛn. We tu tişt jî - êdf- nedixwarîn.

Dîsan, di dana evarekê de, piştî ku refên hechecUcan koç kkin û çûn, serê hechecUcê ket ber wê.
DUê bîçÛk yê hechecikê hew dikarîbû li hember ve qahr Û keserê rawesta...
Ez dî cîhê xwe de vecmiqîm. Ez kelgkî bÛm Û hema revî-yam, çÛm nUc kalike xwe. Min xwe avet hembeza wî û je pksî:
- Çima melayîke li hechecUca reben miqayke nebÛn, le
99
xwedî derneketin? Ma ew jî ne v/eke melayUcekê xweşUc îi rindUc bû? Ma melayUcan jî tevî hechecUcan koç kirîn? Çima ew lê xwedî derneketin?
Wê şevê, gava ez razam, min hechecUca reben jî danî ber serê xwe. Ew heta sibê, li ser bahlîfa min, li nik min ma. Si-bê jî gava ez hişyar bûm, min li bexça hewşê, li nav gulan cî-hekî veda û ew li wê derê veşart. Gava min hechecUca xwe spart gulan, min sond xwar ku min dê wê qet ji bîr nekira. Gava te, li bin wê darê, di derheqê dostê min de got, «în-şallah ez xebera xirab, kuştina wî seh nakim», hingê dUê min dîsan bi êşeke nas perçiqî. Ez dîsan kelgkî bûm. Lê hingê ez tênegUiîştim û min jê dernexist ka ew êş, ew jan ya çi bii. Ez pir li ser fikirîm, lê digel vê hindê jîminjê derne-xist.
Lê belê, bi dii demeke dûr û dirêj re, dema min heşê xwe yê westiyayî ragUiand pey salên rabirdii, hingê min kahnîû rêça wê êşê fahm kk; êş ya hechecUca bextreş bii, ji ho wê bii, êş, êşa mirina wê bû, êşa mirinê bii. Hevalên wê çiibûn, ew mabii. Eş, êşa vê yekê bû.
Min sond xwaribii ku min dê ew û êşa ku wê li pey xwe berdabii, qet ji bîr nekka. Lê wext... wext bi lez û bez heri-kîbil. Wext... perda xwe ya jibîrkirînê bi ser min re vegirtibû îi ez fetisandibûm. Ya rastir, wê heşê min fetisandibû...)
Gava ez û kalo - dîsan wê rojê - piştînîvroyê, li bin darê

rûniştin, min qet fersend neda ku ew lî ser tiştekîdin bipe-
yive. Minjê re got:
- Ez nUia dizanim ka hiin Rîndî kî ne.
Dîgel ku min jê re wê namê xwendibû, ew dîsan jî li ser
gotina min şaş biibû. Şaşbûna wî baş dixuya. Wî jî min pksî:
100
- Wey? De bîbêje ka ez kî me?
- Te lê guhdarî kk... min do jî te re namek xwend, mîn
got. Di namê de behsa merivine dibii. Aha tu yek ji wan î.
- De baş e, ew kî ne? wî dîsan pksî, weke ku wî pê nedî-
zanîbii.
- Rindî, min bi dengekî bUind got. Ew Rîndî ne... û tu
jî yek jî wan î, yanê tu bî xwe jî Rindî yî. Belê, Rîndî.
Cara berê, gava ez ji gund vediqetiyam, te bê sebeb mesela
Rindiyan ji min nepksî. Dema ez zivkîm û çûm welatê xwe
yê xerîbiyê, ez lî ser vê meselê hîir bûm. Lê mîxabin, min a-
gahî û danezanên bi rêk û pêk bi dest nexistin. Ne hêsan e
ku meriv bUcaribe li ser tiştekîku winda dibe, agahî û dane-
zan peyda bUce. Edet û toreyên Rindîyan j î wînda dîbîn yan
jî - meriv dUcare bîbêje - ew winda bûne. Ez niha li welatekî
rojava dijîm û helbet vê yekê jî rê li min gkt ku min bUcarî-
bûya tiştine peyda bUckina. Lê belê, dema ku êdî hêviyên
mîn winda dibûn, ev name hat, ev name gUiîşt hawara min.
Nama ku min do ji we re xwend. Bi vî awayî, ez tiştine li ser
Rindîyan fêr bûm. Ez nUia - kêm be jî - tiştine li ser Rindî-
yan û edet, tore û felsefa wan dizanim.
Kalo, bi awakî balkêş, li tiştên ku min bi heyecan gotî-
bûn, guhdarî kirin û bi dîi re dest bi pîqe pîqê kk. Ev cara
yekemîn bû ku min didît, ew bi pîqe pîq dikeniya. min ev
yek nedipa; kalê ku her dibişkî yan jî carina bi dengekî
nizm dUceniya, nUia pîqe pîq dîkk. Min jî - pêşî hêdî hêdî,
paşê jî bi dengekî berz - dest bi pîqînê kk. Em demeke dirêj
bi pîqîn kenîyan. Dî pişt re jî, wîjî min pirsî:

- Çawan, te niha meraqa xwe deranî? Tu nUia rehet bûyî? Tu hê jî dixwazî tiştîne hîn bîbî?
- Na, min got, êdî ez dê çi bixwazim? NUia kêfa min bi
101
rastî di şiinê de ye.
- Ez jî divê bîbêjîm; kêfa min jî niha dî dewsê de ye, wî bî dengekî nerm got. Li min bîbore, min pir pîrqîn kîr. Lê wîsan dixuye ku me xwe spart siya pîqe pîqan da ku em nî-şan bîdîn ku em niha hîn bêtk kêfxweş in.
Piştî ku
wî ev
tîşt
gotin, wî ji nişka ve - weke ku nii
hatîbe bîra wî - pksî:
- Rast, xwediyê wê namê kîye? Kê ew nivîsiye?
- Hozanekî kal yê Kurd... wî ev name jî min re nivîsî, min got. Ew nUia li Tehranê dîjî.
Pê re jî min navê hozan gotê.
- Ma ew niha lî Tehranê dijî! wî got. Hey gîdî hey... Ez wî şaîrê dînasim. Min di xortîya xwe de, dema Iraq dî destê In-gUizan de bii, ew nasî. Baş e, wî di derheqê xwe de jî tîştîne nivîsîne?
- Naxêr, min bî kurtebkî got. Ew lî ser xwe tu tîşt nanivî-sîne.
Piştî xeberdana me ya wê rojê, dan û standina me hîn çê-tk bii. Wê rojê heta êvarê, heta şivan û gundîhatîn nik me, em bî hev re peyivîn. min niha dizanîbû ka kalo kî bû û wî jî hew hewce didît ku li ser rabkdîiya xwe bêdeng bîma.
Dî wê çûyina min de, ez dîviya du hefte li wê derê bima-

1. Lê ez sê hefte mam. Di nav van sê heftan de, ez her bi kalo re bûm. Em bi hev re, bi qasî ku teqeta wî dest dîda, H dor gund geriyan. Em li ser axê, rengguhertîna wê, kulîlk îi gulan peyivîn. min tîştên ku dîdîtîn, bi dkêjahî jê re gotin.

Wîjî, tiştên ku wî hîs dUckin, bi kurtîji min re gotin. Wî, kulîlkên ku min jê re behs dikkîn, bî destên xwe mîst didan ii
bîhn dikkin. Çend car ber bi dana êvarê, em bi hev re derketîn dervayî gund li lî bin asmana sor, me şivan pa. Me 102
bi hev re şîr vexwar û penêr xwar. Di bin wê darê de wî li bilûrê xîst û min lê guhdarîkk. Em çûn ser kahniyê û Hber ava zelal û hiinUc rûniştin û li wê derê min jê re helbest xwendin, wî lê guhdarî kkin. Carina em bi dkêjahîya deqan H ser tiştine keniyan û carina jî em li ser tiştîne bî dengekî berz «fîkirîn».
Di nav van sê heftan de, ew rengên nexuyayî yên tabloya kalo ku min behs kkibii, hêdî hêdî derketin holê.
Kalo jî
Diyarbekrê bû. Ew li wê derê hatibû dinê û li wê derê mezîn bûbû. Wî li Stembol û Kahîrê edebiyad û ziman xwendîbû. Wî baş bi Turkî, Farisî û Erebî dizanîbû û edebiyatên van zimanan ji nêzîk ve dinasî.
Ew, -piştî xwendîna xwe ya
Stembol û Kahîrê- çiibû Baxdayê û demek li wê derê ma-bû. Ew ji Baxdayê jî çûbû Yewnanîstanê û lî wê derê, li ba-jarê Xanîa ku li girava Gkîdê ye, celebeke Yewnaniya kevn Katharevousa xwendibû. Wî qîma xwe bi Yewnaniya kevn jî neanîbii, herweha ew çiibii Venedîgê û li wê derê jî Latînî xwendibii. Carina wî digot ku ew evîndarê avahî û xanîyên kevn, pk, kuçe û kolan, meydanên biçûk û kadetralên klasîk yên Venedîgê ye. Wî her du şerên cîhanê jîji nêzîk ve dîti-bûn.
- Ez ji şerên neheq, ji awir û fUcrên zordar û şerker nefret dikim, wî digot. Şer, şerên neheq kata herîbUind ya dînîtî, sernizmî, pîsî û qelsiyê ye.
Wî hemû Rojhelata Navîn û welatên Derya Spî -tevî Af

rîka Başûr- dîtibûn. Ew pir geriyabû. Wî rêwîtîya xwe ya dûr Û dkêj weke celebeke skgûnî didît. Weke skgûnîyeke bi êş û qahr, lê di eynî kat de bi havU, bi berhem û zanîn.
Bi kurtebkî; wî gelek cîh û dever dîtibûn, gelek tişt jiyabûn, jî gelek tîşt û kesan hez kîrîbûn û herweha tîştên ku jî
103
bo wî gkîng bûn, çêkkibîln. Di dawiya dawîn de, ew westiyabû û hatibû vê derê, li vî gundê ku li ser tixîibê bû û bi her du aliyên tîxiibê ve jî xwedantekUî bû, bi cîh bûbil. U ew hew ji gund derketîbii. û tîştê herî ecêb; wîli her aliyên cîhanê gelek jîn jî nasîbûn, lê ew nezewîcîbû û zarokên wî tunebûn. Gava ew hatîbû û li gund cîwar biibû, ew 45 salî bÛ.
Wî mesela cîwarbûna xwe li ser kahniyê ji min re gotibû. Gava wî vê yekê ji min re got, min jê pirsî:
- Lê... çima? Tu hê jî xort bûyî û li ber te hê jiyaneke dkêj hebû. Tu dUcaribiiyî dî bajarên xwe yên mezîn de jî bimaya û bîbûya xwediyê zar û zêç.
- Çkna ez dê li wan deran bîmama? wî bi pirsek bersiva pksa min da. Ez jî li ser vê yekê bi dîir û dirêjî fUcirîm. Belê, berî ku ez dev ji bajaran berdîm, ez li ser vê yekê fikîrîm îi paşê jî ez hatîm li vî gundî bi cîh bûm. Tu tekUîyên min bi dînya derve re nemabû ku ez li wan bajaran bîmama. Wekhevî, serfkazî û azadî li dînya derve qetl biibûn. Edet û toreyên Rîndîtiyê jî winda bûbûn... û di mesela jinan de jî, ez ji welatê xwe, ji keç, jin û maderên wîbidûr ketibûm, lê her weha, ez linikjinên xerîb jî nedihewiyam...
Tu
dizanî...
dînya guherî; hêvî, daxwazî, evîn, eciban-
din, dan û standin, qise û kelîme guherîn. Ev tişt ewçend guherîn ku dastan, çîrok, cin, pîrhevok, melayike jî hatin qetlkirin!

Şeytan hat kuştin! Yanê hîs, xeyal û serfkaziya
manewî hat qetlkkîn. Her tişt, her tişt bûn hesabên qurişan.
Min dê lî wan bajaran, dî nav însanên wisan de çi bUcira! Tiş-
tê herî baş ew bû ku min ew însan û dinya wan ji wan re
berda. Bê guman, ev yeka ji bo kesekî ku ji bajaran û însa-
nan hez dike, gelek dîjwar bii. Lê min tu îmkan nemabûn.
104
ez hew dUcaribûm li ba wan însanên ku hem hevûdu û hem
jî însanên belengaz dixwarin, bihewîyama. Min ew însanên
ku
însaniyetiyê dUiencîqandîn, terk kkin. min mal, mUk
nav û deng, derew, çîkosî û duriitîyên wan ji wan re hîştin ii
ez hatim vê derê.
Kalo ji jiyana xwe û bkyarên xwe razî bû. Wî car bi car,
bi dengekî nizm digot,
«serfirazî û bextiyariya manewî...
serfirazî û. hextiyariya manewî pir û pir muhîm in.» Carina
jî, gava ew bîhnteng dibii, wî weha digot; «şer kkin... Wan
şer kîr... gelek kesên ku min dinasîn, bi mêranî şer kkki.
Heyf, hezar heyf ku ez nebûm şkîkê wan... belê, belê... li di-
jî xkabî û zordariyan şer divê...»
Bîr û baweriyên wî yên li ser gundiyan jî gelek balkêş
bûn. Şevek, di saeteke dereng de, piştî ku şivan û gundî çûn,
wî li ser gundiyan weha got:
- Heta ku ez nehatibûm vî gundî, min baş nedizanîbû ka
tirsa dUê van însanan çi ye. Piştî ku ez hatim, ez têgUiîştim
ka ev însanên paqij, destvekkî û reben çima ditksîn. Ev în-
san pir dkirsin. Gundî bawer dUcin ku ew dê winda bin, dii-
zana wan dê tev li hev be, ew li ber windabûnê ne. Helbet,
dijîtî û berberiyên wan jî li gor xwe hene,_lê ew pir baş diza-
nin ku ew ji xerîban cUiê ne. Ma tu bawer î ku ew, weha bê
sebeb, li quntaxên çiya, gelî û newalan dijîn?.. Belê, wan
xwe spartiye cîhên çetin. Çima?.. Ew dixwazin xwe jî xerî-

ban bîparêzîn. Ew dizanin ku xerîb xerîb in. Yanê xerîb, zor û zordarî, talan, guhertina edet û tore û jUievketîna mal îi malbatan in. Ez bawer dUcîm, ji ber vê yekê ye ew dîxwazîn mefhiima wext ji holê hUdîn. Ew dîxwazin «bêwext» bîjîn. Ew guh nadîn herUcîna wext û - ez dikarim bîbêjim - ew di nav valahîyekê de dîjîn. Ev însan hatîne jîbîrkkin, ew bi

105

tenê hatîne hîştin û ji dinya derve re gktî mane. Mebesa mm bî valahîyê ev yeka ye; wan hay ji guherînên dînê tune. Ew nabînin ka dînya ber bi kû de dere. Ax... ez nUia dU dUckn ku ez bUcaribûma hîn bêtk dî nav wan de bûma, ez ji dinya ii tecrubên wan hîn zêdetk destkewtîbûma, min bUcaribûya piştgktî li wan bîkka!..

Şeva ku kalo ev tişt gotin, ez li nUc wî, li oda wî razam. Mîn bî xwe, ev yek dU kkibû; min dixwest ku ez bi vî awayî şevên wî jî binasîm. Ez li ser doşega li erdê raxîstî razam, - eger merîv bUcaribe je re razan bibêje. Ji lewre kalo, hemû şev, di xewa xwe de peyîvî. Ew her di nav nivînê xwe dipeyivî. Ez nîvê şevê rabûm û çûm ser serê wîrawestiyam. Min dixwest, ez bizanîbim ka ew razayî bii. Min bang lê kk, lê tu deng jê derneket; ew radîziya. Tiştên ku kalo di xewna xwe de dîgotîn, nedihatin fahmkkin. Carina hinek peyv heta guhên min dihatin, lê min jê dernedixist ka kalo çi digot.

Ber bî destê sibê jî, dema ez dê bUcetima xew, ew hişyar bû. Bi qasî bîskekê, wî li ber xwe tiştine gotîn û di odê de geriya. Ew çend car jî derket derve. Serê min dî bin lehîfê de, min lî wî guhdarî kk.

Sibê, gava min jê re got ku ew di xewa xwe de dîpeyîvî, tu tişt nehatîn bîrê.

- Ez pir xewn dibînim, wî got. Ya rast; ez di navbera xewn û rastiyê de derkn û têm. Carina ez bawer dikim ku ez xewn dibînim, lê jî nîşka ve têdigUiêm ku ez di esasê xwe de difikkim, belê, bî tenê dîfUckim. Carina jî tersê vê yekê di-

be, ez bawer dikim ku ez hişyar kn, lê ez dîfUcîrkn. Belê, hingê di esasê xwe de ez dî nav xewneke sîvUc û ronî de dî-gerîm. Heye ku ez di wê navberê de dipeyîvim jî.
Tiştên ku kalo hêdî hêdî û bî kurtebkî dîgotin, ez kêf-
106
xweş dUckim. Meraqa min êdî daketibii. Lê belê, digel vê hindê, ez dîsan jî, bi her awayî, ji rewşê ne razî bûm. Mîn dixwest ku ez li ser jiyana wî hîn bêtîr tişt bîzanîbîm, fêr bibim. Ev yeka ne ji ber meraqê bû. min dixwest bUa di des-tê min de li ser jiyana wî agahîne hebin da ku ew ji bîr nebe. Ev kalê rind dê sibê roj «koç» bUcka... lê min nedixwest ku ew bêşop biçûya. Ji lewre, carekê, gava em bî hev re rîi-niştibûn, wî ji min re behsa bîranîneke xwe kirîbû. Wî weha dîgot :
- Dema ez hê pir xort bûm, ez û hevaleke xwe ya keç ku Yewnanî bû, bi hev re çûn gkaveke pir xweş, bêdeng ii biçûk. Rojekê, ber bi hingura êvarê, em li perava deryayê, H ser qiiman, bi hev re raketin. Av û pêlên hîinîk û nerm heta ligên me dihatin. Li hember me asman raserî sor bii; ro li me diçû ava. Qîimên bin me germ bûn. Em demeke dirêj li wê derê di hembêzên hevîidu de çûn û hatin. Paşê jî, em, bi ser-mestiya hezkirinê, rabûn û li ser qiima nerm û şU geriyan. Lê bi dîi gerînê re em dîsan vegerîn û hatin cîhê ku me hev-iidu hez kiribû. Lê tu tişt, tu tişt li holê nemabû. Tu şopjî me nemabii, me nedUcaribii tu şop hUanîna. Weke ku em qet nehatibûn wê derê, weke ku me li wê derê bi saetan ji hevîidu hez nekiribû. Ne ji hezkkinê û ne jîji gerê tu şop hebûn. Her tişt winda bûbû. Qîim paqij û yekser bû. Merîv digot qey ji sedsalan vk ve, tu kes nehatibû wê derê. Bayên sivUc û pêlên hUdayî her tişt winda kkibûn û ji holê rabkî-bûn. Jîn jî aha ev bii; weke hezkîrinek li ser qîima şU, germ ii bêdawî... hezkkineke ku ba û pêl dê bî dii re bihatma îi şopên wê ji holê rabkina...

Ev bîranîn li min pir tesîr kk. Ji lewre min dîxwest ku
ez wî û jîyana wî baş binasim û tîştên ku ew dibêje, bînîvi-
107
sînim û dagkîm kasetan.
- Ma pêwîst e ku her tîşt bîbe qîim û tu şop lî pey merîvan
nemînîn? min jê pksî. Bi qasî ku ez dizanim, merîv dikare
şop û herweha tiştîne jî lî pey xwe berde, - ku her tîşt nebe
jî, tiştine... Eger hiin bixwazin, em dikarin vî tiştîbihev re
bUcin. Hiin ji min re bîbêjin û ez jî tiştên ku hiln dibêjîn, da-
girîm kasetan.
Lê wî pêşnîyara min nepejirand.
- min di esasê xwe de, wextekê, tiştine nîvisîbûn, wîgot.
Lê jî mêj ve. Ew tîştên ku min nivîsîn, piştî ku ez hatîm vê
derê, yanê gund, winda bûn. Niha jî êdîjîna min û bîranî-
nên jîna min bûne weke helqeyên zîncîreke şkestî ku bela
wela ne. Ez dê çawan helqeyan berhev bUcim, wan bicivînim
ser hev? Ma teqeta min ji vê yekê re heye? Ma wisan hêsan e
ku însan bîkaribe bîranînan, xatkan ji quncikên wan yên ve-
şartî werîne? Paşê... ew dê çî alîkariya vê yekê bibe? Di ew
dinya ku hiin tê de dijîn de,
pk tişt tên gotin, pir û pk. Çi
riimet
ii hêjahiya jîna min, bîranînên min û qisên min H
hember wan kelehên spehî yên kelîme û qisan heye?..
Piştî vê xeberdana kalo êdî ne hewce bû ku ez li ser goti-
na xwe înad bikim. Lê belê, min dU tunebû ku ez wisan zîi
bi zîi dev ji wî berdim. Min dixwest, di her fersendî de, jê
tiştine bipksim û - bi qasî ku dibii - jê tiştine fêr bibim. Yek
ji ew tîştên ku min dixwest fêr bibim, mesela Rindiyanbii;
kalo çawan bûbû Rindî û çima? Lê min newêrîbii ku ez vê
yekê hema jê bîpksim. Ez dîtirsiyam ku ew bersîv nede îi
nebêje. min dîviya di demeke wisan de jê bipirsiya ku wî bi
daxwaz û best bersîv bida.

Rojekê min ev keys bi dest xîst. Ez dîsan rêwî bûm; ez dê dotka rojê bîketîma rê. Gundiyan wê rojê - jî ber çûyîna
108
min - ez, kalo û şivan ezimandibûn. Me dê bi hev re fîravîn bîxwara. Gundî jî wê rojê li gund bûn. Çend kes jî ji gundên doralî hatibûn. Gundiyan sîfrek ji bo bUiîst kesan li bin darê raxistibûn.
Fîravîn bi xeberdan û pîqe pîqa gundiyan derbas bii.
Dara reben ji ber pîqîna wan dUiejiya. Bi dii fîravînê re jî, bî qasî demeke dkêj, em li wê derê rûniştin û peyîvîn. Paşê, ber bi êvarê gundî kom bi kom ji min xatk xwestin û rabûn çûn. Şivan jî rabîî çû; kerî dê bUiata. Ez û kalo bi tenê mabûn. Kêfa wî di şiinê de bû. Piştî çiiyina şivên, wî bi kêf got:
- Ev gundî çi însanên cUiê ne! Tu dibînî... ew çawan eleqeke nêzîk û rêz û rêzdariyeke germ nîşan didîn? Ez jî te re tîştekî bibêjim?.. Belê, şîretek ji bo te; dema tu dîxwazî ruhê xwe ji gemariyên dinya derve paqij bUcî û xwe ji wî derê bi dîir xînî, hingê tu divê werî ba gundiyan û demek li ba wan bimînî... Ew ji dinya derve pir bi dîir in...
Ev dem, tam dema pksa min bii. Ew pirsa ku min ji wexteke çê re veşartibii. Min dîviya niha jê bipksiya. Min xeberdana wî birî û jê re got:
- Ez tiştekî pir meraq dUcîm, tu çawan bûyî Rindî? Çî bûn sebeb ku tu ketî ser vê riyê?
- Te dîsan tiştekî ku min nedipa, pirsî, wî got û bi vî awayî nerazîbûna xwe nîşan da. Bi dîi re jî wîbiken «ev meseleke dûr û dkêj e» got.
Di kena wî de nUia şopên derd û keseran dîxuyan.
- Ne xem e, min got. BUa mesele dûr û dkêj be. Ez dîxwazîm lê guhdarî bîkkn. Eger hûn newestîyayî ne, ez tUca dUcîm... behsbUcîn.
Bî qasî kêlîkê ew bêdeng ma. Ji ber ku vê bêdengîyê

109
nîşan dida ku ew dê bîpeyive, ez jîbêdeng mam. Paşê, wî bî dengekî gelek dUsoj û nîzm, dest pê kir û got:
- Ez bawer dikim, her tişt bi daxwaza xwendinê dest pê

1. Hê di xortîya xwe de min dest pê kir û ji xwendinê hez
2. Ew hezkkîneke ecêb bû...

Dengê wî nUia pir bî zehmetî seh dibû. Jî bo ku min bUca-rîbûya ew baş seh bUcka, mm hînekî din nêzîkî lê kk.
- Tu ew malên fireh yên Diyarbekrê dîzanî. Malên ku xwedî hewşên fureh în. Aha zaroktî û xortiya min dî maleke wîsan
hewşfueh û pkode de biirî. Di hewşê de bexçeke
fireh û bîreke kîir hebûn. Taxa me jî ji aliyê mîHî û dînî
têvel, rengîn û tev li hev bii. Lî taxê pir malbatên Asiir, Cihii
îi Ermen jî hebûn. Dan û standinên me û van malan bi hev
re pir baş bûn. Em, weke mal, diçiîn serdana hevûdu. Her-
weha gelek hevalên min jîji wan bûn. Ez bawer dikim tesîra
van dan û standinan jî bû ku ez - paşê - welatên nii bibî-
nkn... Lê tiştê ku min dîxwest bibêjim ne ev bû... Dema ez
hê zarok bûm, bavê min wefat kkibû û diya min jînebîbû.
Wê di pey bavê min re mêr nekkibii. Ji ber vê yekê, kalikê
min li me dinîhêrî. Ez lawê malê bûm. Ji min pê ve tu law
tunebû. Ez bawer im, hinek jîji ber vê sebebê, kalikê min ji
min pir hez dikir. Ez bi her awayî li ber destên wî mezin
bûm.
Kesê ku ez hînê xwendin û kitêban kirim jî, dîsan
kalikê min bii. Lê belê, ev tişt ne bi awayê ku em pê dizanîn,
çêbû... Belê, kalikê min tim û tîm ji min re çîrok, dastan îi
efsane digotin û dixwendîn. Lê ev tîşt ji bo daxwaziyeke
ecêb mezîn, jî bo xwendinê, kêm bûn. Rojek...
Wî, li wê derê, xeberdana xwe bkî û hêdî hêdî cîxareke
pêçayî bk devê xwe û ew vêxist û bi dii re jîji min pksî:
- Rast, nUia... tu mana van tîştên ku ez qal dîkkn, hene?

110
- Belê, helbet, min bî kurtebkî gotê. Çawan tune?
Wî got «de baş e, de baş e» û kelîkê serê xwe hejand îi
paşê dîsan dest bi xeberdana xwe kk:
- Ez di xortîya xwe de li pey hez, kêf û henekan bûm. Ro-
jeke ji wan rojan kalikê min bang min kir û ez gktîm û bkim
zêrzemîna mala me. Li malê, tam Hbîn mîtfexê zêrzemînek
hebû.
Em
bi derencan dadUcetîn zêrzemînê. Zêrzemîn ta-
rî bû û bîhneke genî jê dUiat. Me ew der bi kar nedianî. Tiş-
tine ku pir kevn bûn û êdî nedUiatin bUcaranîn, lî wê derê
bûn. Gava pêwist nebûya, tu kes danedUcet wê derê. Ez şaş
mabûm. Çima kalikê min weha ji nişka ve radigUiîşt min ii
ez dibkîm wê derê? Di destê kalikê min de çkayek hebû.
Ez û kalikê xwe bi hev re, heta quncuca herî bîn ya zêrze-
mînê çûn. Li wê derê enbareke textîn ya gênim hebû. En-
bar hew dihat bikaranîn. Kalikê min bi destê xwe enbar nî-
şan da û got; «binUiêre, li pey vê enbarê odeke hiir heye...
êdî ez kal bûm, îro, sibê ez rêwî me. Skekî veşartîyê mal-
bata me heye. Edî wext hat ku tu divê bi vî skê me bîzani-
bî; oda lî pey enbarê celebeke oda xebatê ye. Oda malbata
me ji bo xebatine veşartî... Mezinên malbata me herçî kitêb,
kovar, rojname, destnivîs ku li ser malbata me û li ser tarîx,
edebiyad û çanda welatê me ne, li vê derê veşartîne. Bî vî a-
wayî wan xwestine ev tiştên giranbiha ji dijmin biparêzîn...»
Bi dii vê xeberdanê rc wî destê xwe kir çavUca enbarê. Wî
bi destê xwe tiştekî kir û bi vî awayî deriyekî hûr vebû. Pîş-
tî ku derî vebû, ew li ber derî xwar bû û derî û hundkê en-
barê nîqanî min da. Gava ez jî li ba wî xwarê erdê bûm, wî
weha got; «tu telizan dibînî?.. ode li pey van telîzan e. Tu
divê telîzan bîdî alî da ku xwe raghînî odê. Jî bo ku tu bi-
kevî enbarê, tu dîvê vê çenqala ku li ser çavUca enbarê ye,

111
hUdî. Tu dikarî bi vî awayî bîkevî odê. û gava tu li odê ye, tu divê bala xwe bidî tiştekî; li ser masa biçûk saeteke qiimê heye û tu divê saetê bizîvkînî û serrast bUcî. Ev yeka pk muhîm e. Ez nîzanim ka mezinên me çawan çêkirine, lê ew saeta qilmê tiştekî nîşan dide; însan çiqas dîkare li odê bimî-ne... Dema qîim li çavUca jor ya saetê nemîne, însan divê jî odê derkeve. Ji lewre êdî hewa odê diguhere û însan hew di-kare lî odê bimîne. Niha tu bi çîroka odê jî dizanî. Jî îro pê ve, êdî tu mesîilê odê yî.»
Lê belê, ez wê demê li pey tîştên din bûm. Çavên min bi tîştên din hatibûn gktin. Kitab, rojname, kovar û tiştên we-ha nedihiatîn bîra min. DUê min yê xort li pey tahm û xwe-şiyên nû dibezî. Min dixwest ku ez jî her celeb xweşî ku her celeb însanan tahm dUckin, tahm bUcim û li wan hiir bibim... Heta kalikê min wefat kk, ev tişt her weha dewam kir.
Tam di wan rojan de ku herba dinê ya yekemîn kuta dibû, rojek, ber bi êvarê, kalikê min wefat kîr. Belê, her tîştê min, roniya çavên min kalîkê min wefat kir. Mkina wî ji bo min biî darbeke gkan.
Weke ku dU û mêjiyê min bi girane îi
zompan bihenciqin... hingê min xwe pir jar, bêhêz îj qîiwet ii bêkes hîs kir. Herweha êşeke wîcdanîjîbi ser serê min re hat; wî hêvî hebii ku ez dê daketima odê. Lê digel vê hindê, ez di saxiya wî de tu car daneketim odê...
Min bi vê dilêşiyê xwe avêt odê. Tu dan û standina odê bi zêrzemînê re tunebii. Ode ecêb spehî bii; hemiî dîwar bi refên neqişkkî ve dorgktî bûn. Kîtab bî awakî pir bi rêk ii pêk li ser refan rêzkîrîbûn. Li odê maseke pîr spehî û biçiîk iî qenepeke xweşik jî hebûn. Eşkere bû ku qenepe ji bo ku însan xwe li ser dkêj bike, hatîbii danîn. Li ser masê çkake hiir û saeta qiîmê ku kalikê min qal kkîbii, hebûn. Sê
112

çavikên masê hebûn. Dema min ev çavUc vekkin, ez şaş îi mat mam; di çavUca herî bîn de siiret, name û destnivîsên - tevî bav û kalikê min - mezkiên malbata me hebûn.
Dî çavîka navîn de nivîsar, şîîr, destnivîs îi nameyên şaîr, nivîskar û pêşewayên herî mezin yên tevgerên me yên mîUî îi çandî hebûn. Destnivîsên wan jî pir bûn. Di çavUca herî jor de jî sîiretên van şaîr, nivîskar û pêşewayan hebûn. Kitêbên li ser refan jî bi giram û hurmet hatibûn rêzkîrin. Wisan dixuya ku kalikê min tim û tim dihat odê û kitab ii tiştên din paqij dUckin û ew disenifandin. Hingê min baş fahm kir ka çima di nav kitêbên me yên jor de ku li oda mezin bûn, kitêbên li ser tarîx, edebiyad û çanda me tunebûn. Ew hemîi di oda veşartî de bûn. Di oda veşartîde ref bi ref her celeb kitêb hebûn.
Edî min dest pê kir û ez her tim çûm odê. Ez bi her awayî bi kitêban re bûm heval. Ez ketim nav dinya wan ya dost û germ. Ev tişt herweha heta demeke dîn jîdewam kk. Lê bi dû çend salan re ez derketim dervayî welêt. (Ez diviya derketima. Min nedixwest, lê ez mecbiir mabûm...)
Hîngê, di wê odê de, dan û standina min bi kitêb û xwendkiê re çêbû. Hingê min fahm kir ku tahm_a dinya bêdeng ya kkêban jî heye. Min di nav dinya bêdeng ya kitêban de evîna Zîna bedew nasî, rastî derd û kulên Siyabend hatim, ez di kitêbxana spehî ya Mîrên Botan de rûniştim û min şîîr nivîsîn. Di nav wê dinya bêdeng de ez bûm pardarê derd îi hêviyên Ehmedê Xanî. Ez li çarmedorên welatê xwe - gav bi gav - geriyam. Ez çûm û bûm mêvanê însanên welatê xwe, ez bî wan re kêfxweş bûm, kenîyam, xemgîr bûm û gkiyam. Di destpêkê de ji ber qahra kalikê xwe û hkiek jîjî bo meraqan, min ew xwendin.
Lê dî pê re, xwendîn û daxwaza
113
xwendinê pêl bî pêl zêde bû. Ez hew jî kitêban vedîqetiyam.

Kîtêban alîkarîya min kir ku ez xwe, însanên xwe û însa-
netiya xwe bînasim. Wan jî min re derîyên nû vekkîn. Aha
yek jî ew derîyên nû jîjî riya Rindîtiyê re vebii...
Ez bawer dikim, xeberdana kalo ya herî dkêj ku mki lê
guhdarî kkîbii, ev bû. Min dUcarîbii hê bi saetan lê guhdarî
bUcira. Lê baş dixuya ku ew westîyabii. Piştî ku wî cimla
xwe ya dawîn jî got, wî dengê xwe bkî. Ew bîskekê bêdeng
ma û bi dîi re lî destên min gerîyan û ew dîtîn. Wî destên
mîn xistîn nav lepên xwe û got:
- Kurê mîn, Serdarê min... ez westiyam.
Ev cara yekemîn bû ku wî ji min re «kurê min» digot. Lî
ser vê gotinê, ez rabûm û ketîm bin çengê wî û ew bir oda
wî. Tiştên ku wî behs kîribûn, dî serê min de pirsên nû çêki-
ribûn, lê min wext dîvîya da ku jê bipksiya... Wî li odê, lî ser
cîhê xwe pal da û ez jî bi şîin de vegerîyam da ku ji odê de-
rêm. Hingê wî bi dengekîkelgkî, li pey min got:
- Mixabin, pir mîxabin... Me nUcaribû wê kitabxanê bîpa-
rasta. Ew kitêb, kovar, name û siiret jî çûn... Me nekaribû ew
biparastîna... Ew şewata 1925 an ya Diyarbekrê mala me jî
bi erdê ve kir yek...
Wî peyv bî peyv û hêdî hêdî ev tişt gotin.
Lê hingê
min - hem nexwest ku ew eciz bibe û hem jî min cesaret ne-
kk - jê nepksî ka ew çima weha peyv bi peyv peyivî. Min
derî li pey xwe girt û ez jî odê derketîm.
Ez sê hefte li wê derê mam. Sê hefteyên ku qet jî bîra
min narîn...Piştî bihevrebûna sê heftan, min kalo dîsan lî wê
derê, lî nUc gundîyan hîşt û ez vegeriyam welatê xwe yê xe-
rîbiyê. Lê berî ku ez ji kalo veqetim, min jê re got ku ez dê
di meha Adarê ya sala pêşîn de dîsan werim. Hîngê min dê
114
dest pê bUcka û lî ser dastaneke kevn bixebkîyama. Ji bo vê
yekê jî, alîkariya kalo divîya.

(Lê... ev hevîidîtîna me ya dawîn bû, kalê rkid, ya da-
wîn... Belê, ev cara dawîn bû. Min bi vê yekê nîzanîbû. Min
wisan dihesiband ku ez dê dîsan, careke dki, jî bUiatima nUc
te, bi te re bipeyiviyama, ji te tîştine bîpirsîyama... Belê, me
dê dîsan hevûdu bidîta! Min dê pksên ku ez lê dîfikirîm, ji
te bîpksiyana û em dê - îcar - demeke dkêjtk li nUc hev bii-
na!
Ez weha dîfikkîm... ez, dUsaf û nezanê Xwedê!..)
115
«
Tam piştî salekê, di meha Adarê de, ez dîsan çûm gund.
Min ji bo kalo tîştîne kirîbûn û plan û bernama xwe ya îcar
dî serê xwe de çêkkibû. Ez dê, îcar, demeke dirêj li gund
bknama. Ez û kalo, bi hev re, dê li ser wê destana ku min jê
re behs kkibû, bixebitiyana û em dê bi hev re li der û dorên
gund bigeriyana. Em dê bûbûna dostên tebîata nîivejiyayî.
Me dê gelek tiştên din jî bUckina.
Lê belê, tiştên ku ez difikirîm - qet yek jî - bi cîh nehatin.
Min nedikaribîî tu tiştî jî bUcka. MelayUca ku kalo, bi bîhna
fureh, li hêviyê bû, hatibû û kalo hUgktîbû û bîribû. Ber bi
kîi? Ber bi cîhên nexuyayî. Kalo ber bi deverên nexuyayî îi
nenas çûbû.
Meriv çawan, bi çi awayî, dUcare hîsekî weha bîne zimên?
Kalo tunebii. Kalemêrê ku her li oda xwe yan jî li bin darê
biî, hew li oda xwe ya biçûk bii. Ew hew li doraliyê gund
bû, Ew derneketibû rêwîtiyekê jî. Bi kurtebirî, ew wînda
bûbû, ber bî cîhine çûbû ku meriv nedUcaribii xwe bigîhandayê.
Şivan û gundî pir li ber kalo diketin. Ew di nav şîn û êşe-
ke ecêb mezîn de bîln. Berî hatîna min bi du heftan, kalo
116
rastî melayika xwe hatibîl û ew bi hev re çiîbûn. Weke nUia
tê bîra min; hingê min weha got, «ev yeka, bi her awayî,
bextreşî ye.» Ji ber ku min gelek dU hebû ku gava melayika

wî hat, ez li nUc wî, li ser serê wî bûma.
Li gor ku şivan digot, kalo jî li benda min bûye. Wî çend car ji şivan re behsa min û hatina min kiriye. Rojên wî yên dawîn pîr bêdeng ii sakîn derbas bûne.
Weke ku wî bîr bkibe ku mkîn li rê ye. Di rojên xwe yên dawîn de, ew, bi awakî rehet, li ser cîhê xwe niviyaye. Wîji şivên xwestiye ku ew jê re ji kitêbên dînî û ji hozanên kevnare rêzine bixwîne. Şivan û gundî ji Tewrat, Zebûr, Incîl û Qur'anê perçene û jî rêzên Zend-Awesta jî tiştîne xwendine. Dema helbest hatine xwendin, ew jî biiye şkîkê wan û bi wan re rêzine ji Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanîii Fîrdewsî xwendine.
Qet tu êş û jan lê wernehatiye. Di berbanga wê şeva ku melayUce hatiye de, şivan kalo di nav cîhê wî de bêlebat - lê kenek li ser rîi - dîtiye. Çavên wî yên kor - bi awakîecêb - velckî bûne.
U gundiyan ew, li gor daxwaziya wî, li bin darê veşartîne.
Gava min vê yekê bUiîst, min ji xwe re got, «belê, ev daxwazî tam li gor kalo ye. »
Laşê kalo, bedena kalo nUia li wê derê, li kêleka dara ku ji nîi ve vedijiya, bû. Ew nUia di bin axa mader de bii. Di dawiya dawîn de wî xwe gîhandibû heval, hogk, dost û yara xwe.
Awayê gorê jî weke wîbû; basîd, sade, bi keser û bêdeng.
Ez demeke dirêj - çend roj - lî nik wî rûniştkn. Ez li wê derê hem lî nUc wî û hem jî jê gelek bi dûr bûm. Ez dî nav hîsên dûrbûn û nêzîkbûnê de çûm û hatim û fikirîm û fikirîm û fikirîm. Carina jî, bê ku ez jê bersîv wergkûn, ez pê re peyi-
117
vim.
(Kalê rind... hingê li nUc te, dî wê dema bêdawî û bê ser ii ber de, ez bi te re pir peyivîm. Ew hemîi tişt niha nayin bîra mîn. Lê tê bîra min ku ez lî ser hînek xeberdanên te peyivîm. Ez weke dînekî peyivîm. Di dana êvarekê de, dema si-

yên lî dor darê hîn tarîtk dibûn, ez li ser vê xeberdana te ya jêrîn peyivîm. Carekê te weha gotîbii:
- Eger tu rastîyê bipirsî, însan biçûk û reben în. Lê belê, dîgel vê hindê, em tu carî naxwazîn rebenîya xwe jîji kesekî re bîbêjîn yan jî nîşanî kesekî bidîn. Ji ber ku em şerm dikin, em ditirsin, em li xwe danayînin... û ne bi tenê evjî... jî ber lez û beziya doralî, em wext û fersend nabînin ku em li hev guhdarî jî bUcîn... dî geremoleke weha de em hevûdu dîêşînin û hevîidu ecîz dikin...
Belê, ez li ser vê xeberdana te jîpeyivîm... Çima ez weha dîpeyîvîm? Ez nizanim... Heye ku jî ber windakirina merivekî ezîz bii. Ez nîzanim... qet nîzanim. Lê ez dipeyîvîm, pîr dîpeyivîm...
Ez bawer dUcîm, hingê min jî te re ev yek jî got; gor ii mezelê te, cîhê ku tu lê veşartî biiyî, ji niha ve bûbû ziyaretgeh. Belê, tu bûbûyî ezîz û gor û qebir jî ziyaretgeh. Şax û çiqilên dara ku tu li binî bûyî, her dibiîn rengîn. Jin û keçên xama dUiatin û paçên rengîn bi şaxan ve gkêdidan. Wan jî ruhê te yê rindîxwaz tîştine dixwestîn, tiştên rind, çê, xweş daxwaz dikkin.
Ber bi dana êvarekê jineke pîr hat. Wê, bi hereketên ecêb, dolbenda serê xwe ji xwe kir û ew bî şaxekê ve gkêda. Ew şax tam lî ser cîhê te bû. Dema sibe dibû û tavê xwe diguhezand darê, siya wê şaxê dUiat ser te. Wê tu diparastî. Piştî ku
118
pîrejinê dolbend gkêda, ew dîsan bêdeng hat li ser serê te sekinî û piştê kêlîkê, wê erd veda û şaxeke zirav ya gulekê çand erdê. û berî ku ew ji wê derê here, wê got:
- Kalo ji bo me dua dUckin. Rehma Xwedê lê be. Wîdixwest derd û kulên me ji holê rabin.
Belê, tu niha bûbûyî tîştekî manewî; giyan, ruh. Giyanekî, ruhekî çavtêr, pak, rind, xweşî û serfkazîxwaz û nemk. Belê kalê rind, tu bûbûyî ezîzekî nemir, ezîzekî nemk, ezî-

zekî nemir...)
Tu tiştên ku êdî min li gund bikkîna, nemabûn. Min jî şi-
vên re got ku min çûyin divê. Wan di nav xwe de pere ber-
hev dikirin da ku ji kalo re goreke sade û xweş ava bUcin.
Min xwest ku ez jî beşdarî li xebata wan bUcîm û min hinek
pere dan şivên.
Şeva dawîn, gundiyan ez ji bo şîva êvarê ezimandim. Ber
bi êvarê ez û şivan, bi hev re, çûn bin darê. Gava em rûniştîn
gundiyekîgot:
- Rehma Xwedê lê be, êdî kalo ne bi me re ye, lê me da-
xwaz kir ku em li cem wî, nêzîkê wî şîva xwe bixwin.
Sifre - dîsan - bi her awayî comerdiya gundîyan nîşan di-

1. Li ser şîvê û bi dîi re, mesela ku hat peyivandin bi tenê

kalo bû. Li ser wê.sifra fkeh her kesî - di derheqê kalo de -
tiştekî got. Gundiyekî kal behs kir ka kalo çawan hatîbii
gund :
- Dema cara pêşîn ew hat, ew bi dûr û dirêjî li gundên
doralî çerx bii. Ew hat û bi me re, bi gundiyên din re peyivî.
Wî tu tiştên taybetî nedigotin û jî me tiştekî jî nedîxwest.
Lê bi her awayî xuya bû ku ew jî me cUiê bii. Em zîi fahm
dUcin ka kî rêwî ye û kî ne rêwî ye. Ew lî gundê me û li
119
gundên doralî dîgeriya, lê ne weke rêwiyekî. Piştî demekê jî
ew hat û bi me re peyivî; wî dixwest li gundê me cîwar bii-
bûya. Hînek ji me bi vê yekê kêfxweş biîn, lê hinek jî ne-
biîn. Her kesî meraq dUcîr ka ew kî bû. Her kesî li ser wî tiş-
tekî dîgot. Hînekan dîgotin «ew însanekî xerîb û belengaz
e», hinekan jî digotin «dewletê ew şandiye nav me da ku bi-
zanibe ka em çi dUcin. Ew kesekî neçê dixuye.» Wî bi xwe jî
tu tişt nedigotin. Wî bî tenê digot, «eger ez însanekî xirab
bUn, jixwe ez dê xkabiya xwe rojek nîşan bidîm, hingê jî
hiin dê min ji gund bi der kin, biqewitînin.» Lê bi wext, her
ku wext bihurî, em hînî wîbîîn û ew bû yek ji me. Me hêdî

hêdî bawerî pê anî û me dît ku ew însanekîzane, têgihiîştî û xwedantecrube ye.
Wê êvarê ez fêr bûm ku kahniya gund jîji aliyê wî hatibû avakkin. Gundiyekî weha got:
- Eger ji wî nebûya nUia ev kahnîjî dê nebûya. Em bi xê-ra wî bûn xwedîyê kahniyekê. Wî qet rê neda me ku em jî jê re alîkarî bîkin. Wî bi tena serê xwe, bi perên xwe ve ev kahnî jî me re çêkir. Ew ewçend nefsbiçîîk bû ku wîkahnî da çêkkîn û bi dii re jî, ji me xwest ku em vê yekê ji tu kesî re nebêjin.
Wî nedixwest ku rindî û çêyiyên wî werin zanîn...
Piştîku gundî ev tişt got, şivênjîdest pê kir û got:
- Belê, belê ew ne weke me bû. Gava em tiştekî baş îî qenç dUcin, em dixwazin hema tîştê xwe nişan bidin. Em bi xwe, tiştê ku me kkiye, li der û dora xwe belav dikin. Kalo carina - dema pêwist û hewce bûya - cixarên pêçayî didan me û ji me re li bUiirê dixist. Lê hewqas. Min tu car nedît ku ew zêde peyivî, behsa xwe û kkinên xwe kir. Min tu car nedît ku wî yekî din eciz kîr yan jî bû sebebê nexweşiye-
120
kê.Yanê, ew hem bi me re bû û hem jî ji me pir bi dûr bii. Lê me dizanibii ku ew ji me hez dike. Bîhnfkehiya wî û ew dengê melîil, delal û zîz baş nîşan dida ku ew ji me cihê ye. Meraq û derdên wî çi bîîn? Ez vê yekê baş nizanim, lê qaxîi ii derdên wî ne weke yên me bûn. Mesela; kar, pere, erd, pez îî dewar û tiştên weke van ku ji bo me û jiyana me pir gkîng in, ji bo wî ne girîng û qaxii bîîn. Ez bawer dikim,jiber vê yekê bû ku me bi can û ruh lê guhdarî dUcir. Me dixwest ku em bizanibin ka ew çi difUcke, derd û qaxîîyên wî çi ne... Wî ne bi tenê ji me, herweha ji însan û însanetiyê jî hez dikir. Çend car ez bi xwe lê rast hatim... wî car bi car digot, «însan biçûk û reben in, lê ne mirdar û xirab...»
Em, wê êvarê heta nîvê şevê, li «nik» kalo rûniştin û li ser

wî peyivîn. û gava em rabûn, min gundî yek bi yek hembêz kirin, - ji lewre ew dê dotka rojê, serê sibê li ser karê xwe bûna. Min dê hew ew bidîtina.
Sibê, ez û şivan zii rabûn û me bi hev re xwirînî kir. Şivan jî dê heta bajêr bi min re bUiata. Dema me tîştên xwe didan hevûdu, min jê bUiira kalo pirsî.
- Me bUiîr, li gor daxwaziya kalo, ji xortekî re şand, şivên got. Xort li aliyê din yê sînorê dijî. Xwedê.rehma xwe lê ke, te dît, kalo carek qal kiribû. Me tiştên wî yên din jî - dî-san - li gor daxwaziya wî, li gundiyan belav kir. Lê wî ji te re jî tiştekî berda; pakêtekî.
Min hay ji vê yekê nebû. Ez hem şaş û hem jî kêfxweş bûbûm. Weke ku bîhn li min çUcîyabe, kelîkê deng jî min derneket. Bî dîi re min pakêt ji şivên wergkt. Pakêt mezîn bii û bi riipelên zerbîîyî yên rojnamekê pêçayî bû. Min bîskekê, heta şivan ji min bipkse ka min dê pakêt vekira yan na, bêdeng lî pakêt nihêrî.
121
- Naxêr, min got, ez dê wî nUia venekkn. BUa ew weke xwe bknîne. Paşê ez te agahdar dikim.
122
5
Mîn dU hebû ku ez pakêtê li mekana xwe ya skgiîniyê, li welatê bakiir, li welatê xerîbiyê vekim.
(Kalê rind, min nedizanîbiî ka di pakêtê de çi heye, lê ez baş pê dihesiyam ku wî dê hîsên min yên germ û nostaljîk hîn geştir û xurttir bikirina. Ji ber vê yekê, min pakêt wer-gkt û bi xwe re anî welatê bakiir. Niha tiştekî te jî li nik gula min, di nav kitêbên kevn de hebû. Belê li nik wê gula ku bi min re ji tixîîban biirîbîî û gava min tu dîtibîîyî, ew di bêrîka min de bû. Oda rûniştinê niha hîn germtir bû.
Min li welatê xerîbiyê, li mal, li pakêt, li gul û li der û do-ra xwe niherî. Min bi dirêjehiya saetan li wan nîhêrîn. Paşê

jî min bi dengekî berz ji xwe re got:
- Ax ev bextê çê û xirab! Ax ev qeder û siûda merivan!
Ax ev qeder li siîida me! Ev bêdengî... bêdengiya van tiştan!.
Ev pakêta stiixwar û bêdeng ku li pey kalemêrekî rênas û rê-
çenas maye! Ev gula bêdeng ku ji bexça maleke eşîrî hatibû
jêkirin! Ev welatê xerîbiyê ku di nav bêdengiyeke kiir de ye!
U ez... Ax ev qeder û siûda bêdeng û bêqise û bêpeyv!..
Çima ev qeder û siîid kalê rind, çkna?)
123
Mîn pakêt, di saeteke gelek dereng ya şeveke çUcsayî de,
li mala xwe ku li ser gkaveke Stockholmê bû, hêdî hêdî ve-
1. Ez niha nikarim baş bînim zimên ka hingê, dema min
pakêt vekk, min çi hîs kkin. Ev yeka niha gelek dijwar e. Lê
H gor ku tê bîra min, gava min pakêt vekir, ez şaş mam;
kalo dîsan bi her awayî ez şaş û mat hîştibûm. Qet min hay
li tiştên nav pakêtê tunebii. Kalo tu carî behsa van tiştan
nekiribîl û min nedipa ku kalo ev tişt hemû kiribin jî.
Di pakêtê de tişt li ser hevûdu biîn. Li herî ser, du kasêt
hebûn. Di kasetan de dengê kalo hebii; kalo ew destana ku
em dê li ser bixebitiyana, xwendibû kasetan. Cara dawîn,
dema ez li gund bûm, min teyba xwe ji şivên re hîştibû. Ka-
lo, bi alîkariya teybê, destan dagktibii kasetan. Di destpêka
kasêta pêşîn de wî ji bo min jî çend tişt gotibûn. Wî bi den-
gê xwe yê meliil û zîz weha digot:
- Serdar, kurê min, em li hêviya te ne. Eger tu werî û em
hevûdu bibînin, hingê jixwe ev şkîd me navê. Lê eger em
nUcaribin hevûdu bîbînin, ez bawer dikim, hingê ev şkîd dê
ji bo te bikêr be. Lê îhtimala hevûdunedîtinê pir zêde ye. Ez
bi vê yekê dihesim. NUia, di van demên dawîn de, xewnên
min hîn bêtk û kûrtir in û herweha bêtir tev li hev in. Ez
hew dUcarûn xwe li wan ragkim. Ew min hUdigkin û bi xwe
re dibin. Carina, ez di xewnên xwe de, li pişta pêlên têvel îî
fkeh siwar dibim û ber bi derine derim. Ew derên ku ez ber

bê derim, cîhên pir ecêb in. Min di jîna xwe de ku bêtkî heyştê salî ye, cîhên weha bi tks û xof, lê di eynî wext de, xweş il rengîn nedîtine. Şeveke ji şevan ez dikarkn li wan deran bimînim û venegerim. Ev rêwîtiya li ser pêlan weke rêwîtiyekê di navbera cenned û cehennemê de ye. Berî her tîştî, ez li ser pîşta pêlan ji mala xwe dertêm û hêdîhêdîji
124
nialê bi dîîr dUcevim. Em - ez û pêl - bi qasî bîskekê, bi awakî nerm, li ser avê derin. Lê, di pê re, ba û bahoz li pey me xuya dikin. Ba pêl ser û bînê hev dUcîn û wan diçelqînin. Ev ba nîşan dide ku rêwîtîya me dê hîn bêtk bi lez û bez be... Piştî hUmekê ba dibe bager. Ez nikarim niha, li vê derê, quwet û gure gura bagerê salûx bidim. Tevî bagerê, ez bi gume guma dUê xwe, ber bi pêş dipengizim. Di wê navberê de, dema ez weke miiyekî sivik li ser pişta pêlan ber bî pêş dipengizim, ez li pêş xwe jî dinihêrim. Belê, hingê çavên min dibînîn... Jî ber tksa dUê xwe, ez dîhezim û dîckifim; av li ber min weke çiyan bUind dibe û pêl dide. Lê ez dizanim, piştî pêldanê em dê dîsan ber bijêr dakevin,pk ber bijêr... Hingê, gava em ber bi jêr dibin, rengên keskesorekê dest pê dikin û dixuyên. Lê ji bo ku ez baş dakevim û noqî avê bibim, divê pêlek weke hiitekî were û min hUde û dîsan ber bî jêr daxîne. Helbet, pir bi lez. Piştî ku ev yeka jî dibe, av ii pêl diqelişin û min dîkişînin nav xwe. Hingê ez pir bi lez ber bi jêr «diherikim.» Lê digel vê hindê, êdî ez nahezîm û naci-rifim. Ji ber ku ew derê ku ez ber bê diçim, pir germ e. û ew der ecêb dibiriqe jî. Ez bîskekê di nav refên avê de ku jî rengên keskesorê pêkhatî ne, ber bi jêr gêr dibim. Rengên refên avê ewçend dibîriqin ku çavên min tên gktin. Axir, di dawiya dawîn de, ez digihêm dawiya rêwîtiya xwe; bînê avê. Dî binê ava zelal de her tişt ecêb xweş dixuyên. Her tişt li wê derê - bi awakî baş - ser û binê hev dibin. Ez divê lî wê derê, di binê avê de, bifetîsîm... lê na... ez nefes digîrim ii

didim. Çavên min divê nebînin... lê na... ez pir baş dibînim ii her celeb xweşî tên û li ber çavên min dkeqisin. Her tişt li wê derê sakîn, serbest û ji xirabiyan bî dîir în...
Min dil heye gava tu werî, ez jî te re, qala van rêwîtiyên
125
xwe bikim... Lê ez nizanim... dibe ku ez li wan deran bîmî-nim jî... Ji ber vê yekê min qerar da ku ez ji bo te wê dasta-na ku tu dê li ser bîxebitî, bisecUînim. Eger em nUcaribin hevîîdu bibînin, şivan dê dastanê bide te. Ez naxwazîm ku tu min weke kalekî ku lî ser qewlê xwe nasekine, bizanibî. Ez, tevî dastanê, tiştine jî ji te re dihêlîm. Ev tişt ji bo min pir gkanbuha û hêja bûn û heye ku ji bo te û nifşên nii jî bî kêr werin...
Gelek celebên vê dastanê hene. Dastan li gor kes û deve-ran diguhere. Herweha nav, bûyer û navçên tê dejîdîguhe-rîn. Mixabin, însan nUcare ji van celebên têvel yekî hUbijêre û bibêje, «ev celeb gotin ya herî rast e.» Dastan, dema ew tê gotin, dibe dastan. Her celeb gotîn jî li gor iisU û edetekî ye. Jî ber vê yekê, awayê ku ez dê bibêjim, ji çend celeb gotinan hatiye pê. Bi vî awayî ez dixwazim gotineke, celebeke yek-gktî ava bîkim. Lê ez dizanim ku ev yeka pîr zehmet e. Kê-manî û şaşî dê îlam hebin. Tu divê celebên din jîpeyda bîkî. Ez çavên te radîmîîsim... bUa Xwedê bi te re be û tu di xweşiyê de bimînî...
Piştî vê xeberdanê, kalo dest bi destanê dUcir û ew - cîh bi cîh weke stran û cîh bi cîh jî weke qise - digot. Carinajî wî hinek cfhên destanê dida zanîn û bi bilûrê lêdixist. Wî bi vî awayî musîka wê j î ber bi çav dUcir.
Piştî ku min li kasêtan guhdarî kkin, min ew danîn alî. Hema di bin kasêtan de çend kovar hebûn. Kovar pir kevn biîn. Ew kovarên ciîrbecîir bûn û lî Stembol, Kahîre, Şam, Beyrîîd, Baxdad û Tehranê hatibiîn weşandîn. Zimanên ko-varanjîcihê bîîn; Kurdî, Osmanî, Erebî, Farisî. Lê ew hemû

jî bî tîpên Erebî biln. pir baş dixuya ku di nav van kovaran
126
de dîrokeke veşartî hebû. Paşê, min - bi ecêbmayî - dît ku
di nav riipelên kovaran de bend û nivîsarên kalo hebiîn. Bi
vî awayî, alîkî wî yê din ku min nedinasî, j î derdUcet rona-
hiyê. Dema me - bi alîkariya hevalên ku bi van zîmanan di-
zanîbûn - nivîsarên kalo wergerandin, min dît ku zîmanê wî
pk xweş e. Cimlên wî kin, kurt, sade, sivUc, tîjî û edebî bûn.
Nivîsar bi rehetî dihatin xwendin û li pey xwe talimeke
xweş dUiîştin. Meriv pê têr dibîî û li ser difUcirî.
Hemîî nivîsar jî li ser hinek şexsiyetên edebî, çandî û xe-
batên wan bûn. Yek ji nivîsaran li ser hozanê ku oda kalo di-
neqişand, Melayê Cizîrî bû. Sernama nivîsarê «ŞîîrênMela-
yê Cizîrî û Felsefa Wî ya Jînê» bû. Nivîsarek jîdîsan lî ser
hozanekî navdar yê Kurd, Ehmedê Xanîbii. Sermana vê ni-
vîsarê jî «Ehmedê Xanî-Şîîrên Wî û Cîhê Wî di Edebiyata
Kurd de» bû. Nivîsareke din jî bi navê «Jîn û Huner» di der-
Heqê hozan iî fîlosofê Ermenî Sayat Nova de bû ku di
sedsala 17 an de jiyabû. Li ser hozanê Ecem Fîrdewsî jî bi
navê «Fîrdewsî ii Şehname» nivîsarekê hebû.
Sernamên nivîsarên din jî weha bûn; Şîîr-Rûmî û Hafiz, Zerdeşt û Di
Zend-Awesta De Eelsefa Jînê, Di Mûqaddema îhnî Xaldûn
de Insan.
Piştî kovaran, di bin pakêtê de, deftereke gelek stûr û bi
çermê reş cîldkirî hebû. Li ser defterê tu sernivîs yan jî ser-
narne tunebû. Defter bi qinabekî zirav hatibû gkêdan. Gelo
di nav vê defterê de çî hebii? Kalo dixwest, îcar bi vê defte-
rê, çi nîşanî min bida?
(Kalê rind... ma hewce ye ku ez niha behsa heyecana xwe
bUcim? Min hêdî hêdî gkêkên qînabê vekkîn. min ewçend
ew hêdî vekkin ku deqîqe bûn babUîsk. Yanê hîngê wext raş
127
westiya!

U hingê, wê gavê, min tiştekî bi dU û can û best daxwaz

1. Tu dizanî çi?.. Belê, hingê min dU kir ku her tiştê mala mîn û oda ku ez tê de riînîştibûm; tiştên doralî, gula ku li dîwêr li min dînihêrî û dibişkî, kovarên zerbîîyî ku te ji min re berdabîln,

îî tiştên din bUa bipeyivîna... belê, ew bipeyi-
vîna. Min dU kir ku ew tiştên ku hingê min hîs dUckin, ew hîsên min yên bêdeng û tahzî bUa kincîne ji peyvan çêbîîyî lî xwe bikkina û li hember min rêz bi rêz, car bi car bîstrana. Kaset û kovêrên te, bi awakî ecêb, ez sersem kkim. Bîhn lî min çîkiya. Hingê min xwest ku ez derkevim derve, nefes bigkim, li xwe vegerim. Ez rabûm pê û - weke ku ez niha li ser kaxiza spî dUcîm - min bi ser nêrîna pakêt re parantezek vekk û ez derketim derve. Pêşî ez daketim bexça hundirîn ya xênî. Bexçe, dîsan bêdeng, vedijiya. Ez ber bi aliyê gulan çûm û mîn bîhna bUiara derenghatî kişand hundkê xwe. Min, bi kêfeke kesertijî, kulîlUc û pelên wan yên jar û tenUc mist dan û ew bîhn kirin. Cîhan dîsan weke xwe bû. Tu guherîn tunebii; kahniya jiyanê dîsan weke her carî diherikî. Bi dîî re, min xwe berda nav şeva ronî. Min xwe berda qe-
raxa deryayê û li wê derê, ez bêdeng meşîm. Hêdî hêdî. Kê-
fa xweşiyên ku min nû keşf kkibîîn, yanê xweşiyên ku te ji min re hîştîbiîn, li ser dUê min bû. Lê ne bi tenê kêfxweşî, herweha qahr û keserên min jî bi min re bûn; ew jî, weke sîya min, lî pey min dihatin. Ez wisan bêdeng, li ser riya şevê meşîm, heta ku min dengekî zirav û dUovan bihîst. JinUcekê - pir li dûr -

straneke nerm û meliil digot. Deng ji dîir ve di-
hat û stran bi zimanekî biyanî bû ku ez tênedigihîştîm. Bi qasî bîskekê, li wê derê, li hember stêrkên ku li ser rîiyê avê

128

dixuyan, ez li ser kevkekê rûniştim û min li wî dengê dUovan guhdarî kk. Min bi zehmetî deng seh dikir. Deng bi

ba re biibû yek û her du bi hev re porê min mist didan.
Piştî ku min li wî dengî guhdarî kk, ez rabûm û ber bi
taxa kevn ya bajêr, bi rê ketim. Ji nişka ve best li min rabîî
ku ez herim taxa kevn. Belê, min dU kir ku ez herim û wan
xaniyên kevn û hewşên xirbe bibînim. Min kolanên fkeh,
kuçeyên tarî û teng û pkên ronî li pey xwe berdan û ez gi-
hîştim wê derê. Min dest pê kir û - careke din - ez di wan ri-
yên teng û meydanên biçiîk de geriyam. Bi salan, ez li van
deran geriyabûm, lê xanî, kuçe û meydan nihabi awakîdin
dixuyan.
Tax niha radizîya. Ez hêdî hêdî geriyam. Gava ez ji ber
diîkana kevnar ya kitêbên kevnar re derbas bûm, ez rawes-
tîm. Carina ez dUiatim vê diikanê. Min ji pencerê, li dîikana
biçîîk, tarî û teng nihêrî îl ez fUcirîm, «niha ez jî xwediyê
tîştên kevnar im, nUia ew tiştên min yên kevnar jîdUcarin li
bin gulê, li nUc wan kitêbên din rêz bibin...»
Gava ez hatîm koşa meydana biçûk, ez dîsan rawestîm.
Min - serê min ber bi stêrkan - li xaniyê mezin û kevn'ê lî ko-
şê nUiêrî. Ew qata herî jor ku carina jê dengê piyanoyê bi-
Hnd dibii, niha di nav xewên kiir de bû. Li wê derê, tiştê ku
bêdengîya şevê diqelaşt, kahniya meydên bû. Ez ber bi kah-
niyê çiîm û - bê lez û bez - min dest û riiyê xwe şuştin.
Her tişt niha bî awakî din dixuyan. Ez çawan bibêjkn?..
Her tişt nUia jîndar û hîn xweştk, hîn meMtk dixuyan. Ev
kuçe û kolan, ev xanî û mal, ev hewş, ev bîr, ev kahnî... we-
we ku min car bi car, ev hemû tişt, ji nû ve - li gor daxwazi-
yên xwe - ava kkibûn. Gava ez kêfxweş bûm, ew jî dîbûn şi-
rîkên kêfxweşiya min. Gava ez bîhnteng yan bi keser bûm.
129
wan jî pirûz dUckin... Wan li gor rewşa min reng diguherîn.
NUia, di nav dostiya bêdeng û zelal ya şevê de, ev tişt û ava-
hî bi ser min de dihatîn.
Demeke dkej, ez di nav hîsen têvel de lî kuçe Û meydanen

biçÛk geriyam û bî dû re jî, dîsan vegerîyam mala xwe. Piştî ku ez vegeriyam mal jî, min nUcaribû hema, bi carek gkeken defterê vekirina. Bi qasî demeke dkej, min Hpkakujipencera min dixuya, niherî. Pk, ji dÛr ve, weke kevaneke vekişiyayî dixuya. Min li wê û li lampên wê yên ronî nihêrîn...
Ez wê şevê, hemû şey, bêxew mam. Dî destê sîbê de min gkêk vekîrin. Tîrejen jar yen roja ku li pey pke hUdehat, di vekkina gkêkan de alîkariya min kkin.
Wisan dixuya ku ez - ji bo vekkina girekan - hewcedare rojê bûm... Belê, kalê rkid... divîya wisan bîîya...)
Gava min defter vekk, min dît ku tê de zerfekîpembe jî hebÛ. Rengê zerfe je çÛbÛ. Zerf pir kevn bû. Dî nav zerfe de jî, dîsan, bi eynî rengî, du rûpel hebûn. Ew nameyek bû, nama ku kalo li pey xwe berdabû. Name bi tîpen latînî hatibîî nivîsîn. Li ser namê tu tarîx tunebû. Min cend car, bi ken û bi dUovanî name xwend. Name bî her awayî kalo bî bîr dîanî. Weke ku kalo li hember min rûniştibû û dipeyivî. Name bi helbestek dest pe dUck, - be guman, kalo li gor xwe helbestek hUbijartibîî!..
Di bexçê ku qehra Hafiz tê de hû, gulek hehûye;
Ew her roj bişkiviye, hi rengê xwe yê xwînî.
Bi şev, hulhul heta destê sibê giriyaye,
Bi ahenga xwe, ya ku Şîrazê kevnar hi hîr tîne.
130
Ji bo Rindekî mirin, welatekî asûde yê hiharê ye;
Dilê wî weke bixurdankekê sal hi sal dikele.
U li ser qebra wî ku di bin darên hûnik de maye,
Her seher gulek dihişkive; her şev bulbulek vîçîn dike.
Rêzên ku li pey helbestê dihatin, jî weha bûn:
«Yek ji wan şîîrên ku ez jê hez dikim, şîîra jor ya şaîrê Tkk Yahya Kemal e. Ji zîî ve bû ku min dU dUcir, ez wê li derekî binivîsim. Ji ber bextê min yê çê, ev yeka ji nama min ya herî dawîn re nasîb bû. Carina şîîr, pir bi hêsanî, tiş-

tên ku însan nUcarin bînin zimên, didin zanîn û salîixdan.
Min hêvî heye ku îcar jî weha be û sibê roj, dema min ji
axa fanî xatk xwest, ev şîîr bUcaribe di derheqê min de tiş-
tîne bide zanîn. û kesên ku bipirsin, bibêjîn «ev bUiirvanê
nenas, ev însanê xerîbkîbii?» bUcaribin ji şîîrajor derxînîn
ka ez kîbûm...
NUia, dema ez van rêzam dinivîsîm, şev jî hişyar dibe.
Heyv hUtê. Şev perda xwe ya tarî radixe ser tebîetê. Dinê
heyveron e û tebîet - bi alîkariya heyvê - reng diguherîne;
însan bawer dUce, pelên dara li koşa xênî û axa ku ez her gav
pê lî dikim, bi rengên kesk û şîn dibiriqin..Dar, li cîhê xwe,
weke nobedarê guherînên şevabêdeng, rawestiye. Dîwarê ji-
hevketî yê xênî ji tîrêjên heyvê re «îlanîaşq» dUce. Ez divê
vê yekê jî bibêjim; heyv pir xweş dixuye. Heş, dU û ruh di
bêdengîya şevê de sermest û serfiraz in. û însan, însanetî î-
şev, di vê şeva ku hê nû hişyar dibe de, dest pê dUce û radizê.
Şev hişyar dibe û însan û însanetî dest pê dUcin û radi-
zên... Gelo ev yeka ji bo me însanan qeder e? Sîûda însan îi
însanetîyê ev e?... Lê wisan dixuye ku qedera min dê weke
qedera însanên dîn nebe. Belê, ew dê nebe... Ez bî vê yekê
131
kêfxweş dibim. Ez çawan binivîsim... çavên min hew weke
berê ne, ez hêdî hêdî kor dibim... Her tişt lî ber çavên min
reş dibin. Ez hew dUcarim binivîsim Û bixwînkn. Ez dibim
şkîkê dinya tarî. Ez dê, êdî, xwe berdim hembeza dinya
tarî Û li stranên we guhdarî bUcim... di nav xewnen we de bi-
gerim. Ez dizanim; ez de di dinya xwe ya nû de tişten nû
keşf bUcim Û kêfxweşiyên nÛ bibînim. Bi gotina kurt, ez ji
hal û hewalê xwe razî me.
Lê tiştekî min dieşîne û xemgîr dUce; ez nikarîm karekî
ku di destên min de ye, bi ser xînim Û biqedînim. Berî niha
bi bUaîst Û neh salan, bele tam bihîst Û neh sal, min dest bi
vejandina rûpelen deftera ha kk. Rûpelen vala dest pe kirin

Û bÛn rengfn, bûn peyv û gotin. Hingê, dema min dest pe kk, min bawer dUcir ku ev xebat de di nav çend salan de ku-ta bibe. Lê nebû. û tişte xirab, niha jî ez hew dUcarkn bini-vîsim. Min pir hez dUck ku min karê xwe bi ser xista.
Eger ev name, rojek.bUceve deste hinan, hingê defter jîde ji wîndabûnê rizgar bibe. Ji ber ku ez de vê namê texim nav rÛpelên deftere. Yane name de di nav defter de be. Ev şîîren ku min di defter de nivîsîne, şîîrên kevn in. Min ew di xor-tiya xwe de ji ber kiribiîn.
Ev şîîr, weke kkêb, li nUc min tunene.
Lê eger kesekî yan jî kesine bixwazin kare min bidomînîn Û nivîsîna şîîran bi ser xînin, ew kes dUcarin di van çar deran de şîîran peyda bUcin; di mizgefta taxa kevn yaDiyarbekrê de, - tax li kêleka sûran e. Di manastira(dêr) Suryaniyan de, - manastir li ser çiyayê HerekoH, li kêleka şkeftan e.
Li Stemholê, di nav kitêben kevnar yên Ayasofiyayê de. û cîhê çaremînjî, di kitêbxana mîb' ya Ermeniyan de, - li Erewanê.
132
Belê, hemîî şîîr di van deran de hene. Ji mêj ve, dostên mîn ew bi awakî wekhev, nivîsîn û li van derên ku ez niha navên wan dinivîsim, veşartin. Bê şik, ji bo parastinê. Ew çar defterên wekhev in. Defter, penîis, neqiş, şêwe û şiklê nivi-sînê wekhev în. Min jî dU dikk ku ez van şîîran, ji nû ve, li gor wan û weke wan binivîsmi û şîîran careke din vejînim...
Lê mixabin, nebii, ez bi ser neketim.
Tiştên ku ez niha dinivîsîm, dikarin weke memento morî werin dîtin. Yanê tiştên ku mirinê tînin bîra însên. Lê belê, ma ev yeka di eynî wext de însanbûn û însanetiya me jî nayine bîra me? Em dizanin ku gava dawîn ya jînê ber bi deriyê mirinê ye.
Lê ev gava dawîn ku me ji jînê bi dûr
dixîne, ma ne gava yekemîn ya nemiriniyê ye?
Belê, tiştê ku li pey ger û rêveçiîna li ser qiimê dimîne, dî-

san qîim e. Yanê nemirî...»
Tiştê herî dawîn ku di nav pakêtê kalo de mabîî, hozanekî nemk bû; Melayê Cizîrî. Riipelên deftera ku kalo di nama xwe de behs dikir, bi helbestên Melayê Cizîrî tijî bûn. Defter mezin û cîldkirî bû. Di her rîipelê de hunermendiyeke pir bUind û spehî dixuya. Ev rîîpel berhemên herîbUind yên hêz û quweta hunermendiya meriv bûn. Baş dixuya ku ev rûpel berhemên xebateke pir hîir û kiir bûn. Ji bo afkandina wan, li hember wext şerekî dijwar diviya. Ev rîîpel mînakên herî xweş, baş û spehî yên sûret-nivîsînê bûn. Helbest bi tîpên Erebîhatibûn nîvîsîn. Murekebên rengîn yên çînî rêzên helbestan dineqişandin û her riîpel dikirin tabloke, lewheke pir xweş ku meriv jê têr nedibû. Kalo rîîpel bi hunera sîîret-nivîsîne dagktibîîn û wî di vê xebata xwe de her celeb hunerên nivîsînê, weke xet, tuxre û yên din bi kar anîbûn. Wî her nîşandek, her xêz, her niqte bi rengên
133
kemUî û lîhevhatî raxistibûn. Di rêzan de hunerên deformasyon û stîlîzasyonê jî bi awakî pir baş hatibîîn bUcaranîn. Bi vî awayî, rêz weke siiret û lewhan dixuyan. Ew îmkana ku meriv bUcaribe tîp, hejmar û peyvên erebî bi neqşan bUcemUîne, xweş hatibû bUcaranîn. û elîf, lam, mîm, kaf, re, cîm, nîin, lamelîf bi destên kalo bûbûn motîvên pîr spehî. Baş dixuya ku ev sîiret-nîvîsên kalo hem li gor edet û torekê û hem jî li gor kalîgrafiya niijen bîîn. Kêlek û koşên riipelan jî bî motîvine hatibûn neqişandin.
Meriv dikaribû li ber her rîîpelê, bi rojan rawesta û yek bi yek rêzên helbestan bixwenda û li motîvên ku tîp, hejmar, nîşandek û cimlan nîşan dîdan, bînihêriya. Bî kurtebkî, meriv dUcaribii di nav rîipelan de, pê re bîçîîya...
Meriv li pey barana, xunava van rîipelan dUcare çi bibêje? Kîjan qise û peyv dUcarin vê sermestiyê salix bidîn? Qet tu qîse û qet tu peyv...

Kalekî ku bi tesadufî rastî min
hatibû, niha bûbû perçekîjiyana min...
(Kalê rind, ez hatim dawiya şerê xwe. Min - kêm, zêde - şerê xwe bi ser xist. Şerê min û peyvan - êdî - xelas dibe. Ez dê niha; piştî bîskekê lampa li ser masa xwe jî bitefînîm. Lê, berî ku ez ji masê rabim, min parantezeke nii divê da ku ji te re tiştekî bibêjim.
Min hê jî wan riîpelên vala yên deftera te - weke riîpelên ku te neqişandine - venejandine. Ew riîpel hê jî dî nav valahiyeke dUsoj û keserkûr de li valahiyê dinihêrin. Mixabin, mixabîn, min kesekî ku bîkaribe - lî gor siîret-nivîsînên te - wan riîpelên vala jî vejîne, nedît. Min ji heval û dostên xwe re jî xeber bi rê kirin da ku ew jî alîkarî bikin ku em kesekî weha bîbînin. Tevf ku ew dî cîhên cîîr be cûr de di-

jîn û dan û standinên wan pir fkeh in, wan jînikaribii kesekî weha peyda bUcka. Awa û celebê nivîsîna te jî tam lî gor te ye... ya cîhana te ya kevn e, ya dewr û dewranên kevn e. Winda dibe, kalê rind, ew cîhan winda dîbe, winda dîbe, winda dibe...
Me di Akademiya Hunerî ya Kahîrê de mamostekî kal dît. Wî dikaribû bi stîl û awayê te binîvisiya. Lê mixabin, wî jî zunanê me nizanîbû. Lê hê jî min hêvî heye. Di van rojên dawîn de, dostên min xeberek rê kirin. Li gor xebera wan, kalemêrekî zana, tevî du şagirtên xwe, li Şarezorê, lî gundê hozanê nemir Nalî dijî. Kalê zane pisporê edebîyad û zîmanê me ye û ew jî dUcare weke te binivîse. Lî gor ku dostên mîn nivîsîne, kalo, ne tu, kalemêrê Şarezorê, di esasê xwe de ji Diyarbekrê ye, lê ew çûye û li gundê Nalî bi cîh biiye. U tiştekî din ku balkêş e, ew jî li ber korbûnê ye. Çavên wî weke berê nabînin. Lê, ew bi şev û roj, bi şagirtên re dixebite ku şagkt hunerên wî fêr bibin û piştî ku wî wefat kir jî hunerên wî bimînin.

Bê guman, ev riipelên te yên vala divê stûxwar nemînin.
Wan jî kêfxweşî û serfkazî divê. Jî bo vê yekê jî, çijî destên
min werin, ez dê texsîr nekim. Berî ku kalemêrê zane kor
bibe, ez dê xwe bigihînim wî. Ji bo ku ev riîpel ji valahiya
dilsoj û keserkîir rizgar bibin, ez dê her tîştî bUcim. Bê gu-
man, her tiştî...
De bi xêr û xweşî here kalê rind, bi xêr û xweşî...)
135
Diî mkov. Du rönakbûrên kurd;ronakbîrê destpêka 1900-î:iCi3/o û
ronakbîrê niîjen Serdar /Izad.
Jiyanên wan, hîs û serpêhatiyên
wan, xewn û xeyalên wan, dan û standinên wan bi hev rê û bi
doralî re, dijwarî û berberiyên wan...
Romaina Meihmed Uzun
MirinakalekîRind li dor van kes, tişt û pksiyaran tê pê.
Ronakbîrê niijen Serdar Azad,
peniis di desta de, li ber masê
riidine û rohakbîrê kevnare JCaZo
bi bîr tîne; gundekî biçûk û kalemêrekî eeêb.
Kalo kî ye?
Ew ji kû ye? Ew çi vedişêre?
Serdar Azad, H mUekî, ji xwendevanên xwe re behsa kalê ecêb
û sirrtijî dUce û lî mUekî jî, ew bî Kalö re dipeyive û jê
re behsa xwe, hîsên xwe û zarotiya xwe dike.
Ango, roman, ne bi tenê, li ser du kesan tê pê, herweha ew
bi du şêwan jî tê hiinandin. Mkov dikare Kalo weke
riipeleke jibîrbiîyî ji dfroka Kurdistanê bîbîne, Serdar .şzad
û jiyan, hîs, daxwaz û bîrajnînen; wî jî, weke
mirovekî kurd yê nîijen û jiyana wî... Ji ber ku
kes, biîyer û peywendîyên
romanê herçend şexsî û taybetî bin, ew ewçend jîgelemper in.
Mehmed Uzun, Kurdîstana Bakur e.
Piştî ; eunta leş- 1953, kerî li Turkiyê,

ew hat gktm. Bi qasî du salan, ew H
1970, gktîxanên Dîyarbekrê il Ankarê ma.
Di sala 1976 an de, gava kovara
Rizgarî dest bî vireşînê kk, Mehmed Uzun bû ber-
pksiyarê kovarê. Ji ber vê yeke jî, ew hat gktin û 8 meh ii
girtîxana Ankarê ma.
Di dawîya 1977 an de, ew hat Swêdê.
Li Swêdê; wî berpksiyariya kovara Rizgariya Kurdîstanê
kk, 1979-81. Mirina Kalekî Rind romana Mehmed Uzun ya
duwemîn e.
Romana wî ya yekemîn TU di sala 1985 an de derket.
Omslag: Ingela JondeU
OrfeUS
ISBN 91-87074-02 8
IBRAHÎM SEYDO AYDOGAN
roman
**

MIRINEKE KEDÎ

Bi tena xwe di odê de ma, bihna pîrekê ji her koşekê hildikele, desmala wê ya reng-rengî ketibû binê maseya ku çend firax avêtibûn ser. Piyala wê ya ku, çay jê vedixwer, hîne mîna pûtekî, li cihê xwe bê deng sekinîbû. Dema dêst davêjêyê, şûna lêvsorka wê li ser dibîne. Di aliyê odê yê din de, piyaleke çayê ya nîv tijî danîne, ber bi wê koşê dimeşe û hêdî-hêdî, wêneyên berî demekê kom ser hev dibin û dengê merivê wê yê serdest, ji wê koşê dikşe.
- Ev ên ku li te kom dibin kî ne. Ev bû çend car, ez wan li ba te dibînim û dixwezim ji te bipirsim. Hesenê Îbo, bi dawiya pirsên xwe re, berve pîreka malê dinêre, berkeniya

wê nîşan bide ku kêfa wê ji gotinên wî re hatiye û berî mêrê wê bersivên xwe dide, ew dengê xwe bilind dike.
- Ew ên xwarin û gotinên vala ne, ji bilî firotina gotina.. Bêyî ku, pîreka malê karibe kela xwe birjîne ew tê sekinandin û mêrik awirine tûj jê vedide.
- Ne xeme.. Ji mafê te ye ku tu li ser hevalên xwe bixeydî, bes tu karî bêjî ka tuyê çi sûdê ji wan bibînî? Tu kesekî perîşan û bi tenê ye û eger ne ji mervaniyê ba, min ev şîret li te nedikirin, ne dûre tu van gotinên min di pença
10
wan kî, belkî tu ji xwe dipirsî; ma wê çi ziyanê bighînin te. Divê tu ji bîra nekî ku yekî weke min naxweze dengekî bi tenê jî winda bike. Wî her ku çend gotin davêtin carekê ber bi pîrekê dinêrî ka ew ji gotinên wî razî ye û dengê xwe dide nik yê wî.
Hesenê Pîrê jî di bin ewrên dûmanên cixaran û gotinên merivê xwe de gêj ketibû. Ev bû çend mehên wî ne ku mala xwe aniye bajarokê Cindirêsê. Di roja ku wî biryar da ku dê barî wir ke, ev mervê xwe kiribû bala xwe ku bi riya wî karekî bi destxîne. Gundiyên wî pesin û rûmeta mêrik digirtin û digotin; wî cihekî bilind li cem dewletê bi destxistiye.
- Ewê ji ku ve min nas bike û li min xwedî derkeve.
Dema di civata mal de daxife, bavê wî dengê xwe bilind dike û bi quretî dibêje:
- Law mal xerabo, qey tu nizanî ku ew li ser destên diya te mezin bû û me navê wî jî li te kirî. Van gotinan hinekî dilê wî geş kir û hinek hêvî dane wî.

Di çend rojên pêşî de li wî ne pirsî û dema ku heval hatin ba û li rewşa wî pirsîn, xwest ji wan bipirse; kanî ev kes li kuderê ye û çawa yek kare wî bibîne lê tirsiya ku gumanê bibin ser û bipirsin; tu wî ji ku ve nasdikî û tu yê li cem çibikî. Ew ne ji pirsên wan ditirsî, lê dê nizanîba çi bersivê bide wan. Lewra ew çêrok, çend rojan, da şûn.
Di roja ku soz da û piştî berger û lomeyên jinikê dê here cem wî, hevalan jê xwest ku hajî xwe hebe û gotin; "Emê hinekî çûn û hatina xwe ya cem te kêm bikin, em di wê gumanê de ne ku cîranê te ne îsiz e".
H. Pîrê di van çend mehên ku mal aniye bajarokê Cindirêsê, sinc û perwerdiyeke nuh hest dike, çi ji aliyê
11
cîran û xelkên bajêr û çi ji aliyê têkiliya hevalan ve; cudayîke mezin di navbera gund û vê derê de dibîne. Evê yekê hêştî ew hertim gêj û serêşokî bimîne.
- Te ew dît. Yekî çawa ye. Weke min bihîstî hîne xort e û yek nizane ku wî pêncî sal derbas kiriye. Tu dereng ma, sedî- sed wî nehîşt tu bê xwarin derkevî, bes te xwe ji bîra nekiribe ku tu ji bo çi çûbû cem wî û tu dest vala. Bêyî ku karibe gotina xwe bi dawî bike, mêrê wê bi ser de diqêre.
- Te ez gêj kirim, te haje xwe heye te çiqwas pirs kirin. Dibêjin ku yek çel gotinî bi dû hev bêje dê biteqe. Wa ev bû…
- Babetê neguhêre, te çawakir. Û ji bo min jî, ma te gote wî ku, heya bi rêza şeşan xwendî. Xwedê dikim te ji bîra kiribe. Bi zaravekî tûj gote mêrê xwe û dema mêrik dît bihintengiya wî nema bi kêrî wî tê, destê xwe da sîngê

pîrekê û ew ji bin guhê xwe hilkir.
Bi tena xwe di odeya tazî de dimîne, cixareyekê ji ya din pêdixe û her ku xelekên dûmên bilind û fireh dibin, ew di cihê xwe de diçelmise û biçûk dibe. Piştî dehê caran ji çûn û hatina di pêşiya deriyê wî re, cerg kir û carekêdudwan, gurpînî bi derî xistibû.
- Kî ye. Dengekî zirav, ji kûraniyê de pirsî.
- Ez im.
- Tu kî yî. Vê carê deng nêzîk bû û berî ew bersivê bide, derî vedibe û riwê keçekê derdikeve.
- Bavê te li male. Bêyî ew silavê lê bike, dipirse.
- Belê, ez bêjim kî ye.
12
- Bêje merivekî te li ber derî ye. Keçik birih û çavên xwe hildide, li rû û destên vala dinêre. Dema Hesen destên xwe, di piş xwe de vedişêre, keçik bi rûkenî diçe û dêng li bavê xwe dike.
- Gundiyekî te li ber derî ye. Ew dest vala ye. Hevoka dawî, bi ken, dibêje diya xwe.
- Te ew nas nekir. Dê, bê med, pirsî.
- Ev cara yekemîn e ez wî dibînim. Bavê jî xwest jê bipirse ka navê wî çî ye û ew çi dixweze, lê nerî ku keçik derbasî odeya xwe bû.
Hesenê Pîrê dikir ku ji ber derî bimeşe û rê li xwêdana xwe bibire, wî cixareyek kişandibû û ya dudiwan jî xistibû nav tiliyan.
- Bibore, em hinekî dereng man. Bi gotinê re, mêrik destê xwe dirêj dike. H. Pîrê jî bi lerizandineke bê wate,

cixarê davêje û, bi piştxûzî bi destê wî digre.
- Hûn çawa ne.
- Başin. Me tu nas nekir.
- Ez Hesen im. Min navê te birî, bavê min navê te li min kirî. Çilpikeke xwêdanê dikeve ser lêvên wî û şorbûneke ziwa di sîngê xwe de hest dike.
- Kîjan Hesen.
- Hesenê Pîrê, ez kurê Xelîl yê mezin im û diya min… tu wê nasdikî ku, çiqwas ji te hezdike. Xwest bêje ku "tu li ser destên diya min mezin bûye" lê tirsiya bi wateya parskirinê bê fêmkirin.
- Belê.. belê, tu çawa yî.. çi li gund çêbûye. Her ku gundiyekî wî dihat, ev pirsa wî ya pêşî bû.
13
- Ev bû çend mehên min in, min gund nadîtiye. Hesen bi riwekî beravêtî got. Ew li benda gotina keremke bû û her dereng dibû ew bêtir dadirivî.
- Te çikirî. Bi riwekî sar û dilekî germ pirsî.
- Na.. min mala xwe aniye vê derê. Dilê mêrik sar dibe û hêviya ku ji xwe re çandibû, dê hinek pere jê re bên, tê mirandin.
- Bi bore, emê derbas odê bibana lê ez bi sozekê ve girêdayî me. Te çi dixwest. Hesenê Îbo dipirse.
- Ne tişt. Min xwest silavekê li we bikim, bes xûya ye hûn ne vala ne, bi xatrê we, ezê careke din bêm cem we. Dengê derî pişta wî rast dike û cixareyekê ji bêriya xwe dikşîne; "Tufî.. çima min ewqasî fedî dikir û evqas xwêdan ji bo çi… Ma ne em merivê hev in, çima jê fedî

bikim… kuro, meriv ji ku û hal ji ku, hema negot derbasî hundir be.. Bes mêrik got sozek min heye û ev ne gunde. Çiqwas car te bi xwe gotî ku sinc û rewşa bajêr û gundiyan li hev nayê”. Bi van pirs û sîberan ew ketibû hewşê û pîrekê bi pirsên xwe ve êrîşî wî kiribû.

- Mêrik qedrê mala xwe digre. Ez lê bûme mêvan û min dîtî. Gotina cîranekî wanî gund tê bîrê û H. Pîrê berkenî dibe, hêviya vegera cem wî, careke din şîn dibe û avê bi ber dilê xwe direşîne.

- Ewê alîkariya min bike; sedî- sed mêrik dê bigota; keremke eger sozeke wî ye piwîst tineba. Ezê careke din herim cem û binêrim dê ji min re çi bike. Di vir de, pîreka wî dikeve hundir û bi riwekî sar dibêje, ‘Hevalekî te li ber deri ye”. Hesenê Pîrê bi laşekî sist radibe ser xwe û derdikeve.

14

Çend rojên din diborin, dilopên pîrekê zêde dibin û qîra Hesen jî bilind dibe. Demên ku pîrekê mesele ji bîr dikir jî, wî ji vir ji wir gotin davêtin wê da ku careke din dilopên xwe bi ser wî de biweşîne, heya hêşt di rojeke sar de û bi dilekî lerzokî, li pêş deriyê H. Îbo bisekine û careke din, bi dîtina riwê keçikê re, destên lerzokî di piş xwe de vedişêre û dihêle keçik rûkenî verê bibe.

- Biner, emê bi pirsin da ku em karekî boneya te bibînin, bes divê tu ti serêşiya ji me re çênekî. Hesenê Îbo dibêje û carekê- dudiwan bi çavsorî li pîreka wî dinêre. Piştî berger û dilopên wê, H. Pîrê digel pîreka xwe hatibû cem merivê xwe yî serdest û vêcarê ew bi riwekî din

hatibû pêşwazîkirin û piştî ku çêroka hatina xwe jê re gotibû, mêrik bi kurtî gote wî ku dê binêre..
- Ez benî, ez mirovekî bi tenê me, ezê çi pirobleman çê bikim û ji bo çi. Ez li karekî digerim da ku seriyê xwe û pîrekê ji meseleyên wilo bi parêzim. Hesen di vir de ber bi pîreka xwe dinêre ku, ew jî bi çavin e nîv-damirandî li mêrik dinêre; “Tufî li pariyê nanê di nav pêsiyê de, çi genî ye. Ew jî ji bo min bi stûxwarî li ber wî digere”. Pîrek jî ketibû nav saw û sîberan û pir hêvî, xwestek di çavên H. Îbo de naskirin. Çend rojên din diborin. Pîrek, careke din, dilopên sar bi ser wî de dibarîne. Vê carê bihnê li wî teng dike.
- Ewê ku bixwaze kar bi dest bixîne, divê hertim bipirse û gereke tu merivê xwe jî bînê cem me da em xwarinekê bidinê. Pîreka Hesen, sibê- êvarê, digote wî û her car xwe ji şerekî re amede kiribû. Li dawiyê xwasteka wê bi cih hat û merivê mêr, gumana wê neperçiqand; Ew di rojeke înê de bû mêvanê wan.
15
Çend rojên din diborin. Hesenê Pîrê dibe xizmekarê dibistanekê. Standina xwendina lîsê hêviyek dabûyê ku dê di dibistanekê de bibe mamosteyê zarokan, lê mixabin ji bilî karê xizmekariyê tutişt bi dest neket. Ew ji sibeyê ve ji mal derdikeve û heya piştî berdana zaroyan bi çend katan jî, di paqijkirina odeyan de kar dikir.
Di rojên pêşî de, bi pozbilindî û bi riwekî geş ji mal derdiket, nemaze piştî ku dilopên pîrekê hatibûn birîn, lê ev dilgeşî, bi pêvajoya rojan û riwê serdestên dibistanê û

fermanên wan re, tê vemirandin. “Mirov sewalekî kedî ye, bes çima ez kedî nabim. Ma ne evqas kesên evî bajarî eynî wekî min dijîn, her yek dixwaze seriyê wî yê herî mezin be. Em tev werimî ne, werimandineke bê zayîn; me teva xwe bi bê avis kirî, zayîn ji ku heye. Cudayiya di navbera me de ew e; ku, em hinek ewê yekê zanin ku werimandina me bakî ye û yên din çavên xwe li ser vê rastiyê digrin”. Hesenê Pîrê gihîştibû wê baweriyê ku bajar dê wî yan dîn bike yan jî dê bike merivekî bîrmend.
Nelihevkirina wî û rêvebirê dibistanê di sibeyekê de diteqe, Hesen mîna her roj, ji berî hemiyan gihîştibû wir û dest bi kar û barên paqijkirinê kiribû û ji berî hemiyan dest bi odeya rêvebir kirbû, ji nedî ve mişkekî xwe li nav nigên wî xist û hêşt piyala avê bi ser pelên ku, li ser masê bûn, birje. Bi boneya vê yekê dengê wan bilind bû û hêştibû xeleka mamosteyan li dora wan fireh bibe. Ew bi bihntengî ji dibistanê derdikeve, hilmine kûr ji cixarê ber dide; “Xwe bi segîtiya xwe dibîne, seg kurê segan, eger ne di heyameke wilo de be dê buhaya te ne du pere bana jî. Tu kî yî; çavdêrekî bê rûmet î, karên we fesadî û…”. Dengê nedî ku bi ser de kir qîreqîr, hêşt zincîra ramanan bişele.
16
- Bavê min li pêş xwe binêr. Du gav nemabûn ku teksî li wî bikeve. Hesenê Pîrê nêzîkî li mal kiribû û bi dilopên pîrekê diramî dê çi bersivê bide wê û gava merivê xwe yê serdest hate bîrê, berkenî bû û bi gotinên wî ramiya; “… Mêrik di pêşiyê de gote min ku, tu serêşiyan ji wî re

çênekim û ewê li hemberî çi alîkariya min bike”. Bi vê pirsê re ew derî vedike û bi dîtina sola merivê xwe ye serdest û kenê pîreka xwe re, di nîvê hewşê de dadirive.
Cindirês - 1999
17
ZÎNÊ
Dengê teqe-reqa ber bi ezman ve hildikşî, yekî li yê din guhdarî ne dikir, her çendekan bi ser hevdu ve dikir qîjeqîj û di nav re, carina dengê giriyê wan herdiwan bilind dibû û dikaribû bala yekî bi ser xwe de bikşîne.
Pîrekeke di hevdu de ye, bal û bejna wê dilê mêran geş dike û buharekê di çavan de diweşîne; te ne dikarî, zû-zû, temenê wê nas bikira. Ji cil û livên wê xuya dikir ku, di maleke dewlemend de xwedî bûye. Wê, bi hêzeke bê dilovanî, keçkeke heft salî hembêz kirî û kare di ber de şerê guran jî bike. Keçikê jî, herdu dest di nava wê re birine û, bi giriyekî şîn, hêsra dibarîne û her ku herdu mêrên, ku dixwastin wê ji hembêza pîrekê derînin, hewil didan xwe. Qêrîn û giriyê wan bilintir dibû û bêtir xwe bi hevdu ve girê didan.
Gava polîsan dît ku, çêrok dê bi şîniyeke giran û dijwar bidome, bêyî ku kes karibe wan ji hembêza hevdu derîne, yek ji wan peya dibe û li mêrê pîrekê dike qêrîn.
- Hey gidî! Me fêm kir ku tu di wê çêrokê de ne mêr î, lê di vê derê de jî tu tune yî?! Bilezîn û pîreka xwe
18
bikişîne odê, berî ez çend şeqeman lê didim. Bi gotinên xwe re jî, wî çend xêzeran li mêrik dan.

Ew ji vê sibê de, ji dema ku derî bi hêz hate lêdan û dengê lingên hespa li hewşê bihîst, ji ser hişê xwe çûye. Memoyê Keleş ne dizanî ka ew xewneke pîs e, ku pîrhebokê konê xwe li ser ristiye, an jî lîstikeke qeşmeran li ber deriyê wî li dar xistine.
Tiştên dihatin gotin û bîstin ne diket bal û baweriya tukesî. Lêdanên xizêranan jî, ji aliyê polîsê peya bûye de, ne dihêşt ew ramanên xwe biref bike; cihê wan mîna şîşa êgir dişewitand û hêştin ku, bê naskirin, berve pîreka xwe here.
Pîreka hêç, mîna dêwekî diqîre û, bi veçerpîna laş re, wî û yê polîs li erdê digevizîne. Vê yekê hêşt hevalên ê polîs peya bibin û lêdanên xizêranan, bê hejmar û rênasîn, li ser laşê gundiyan şopên xwe bihêlin.
Di demeke din de bûya, kesekî dê nikarî biwa M. Keleş li erdê bigevizîne û nemaze ji aliyê kê ve; pîreka wî. Wî pênc jin anî bûn, yek jê ber dabû. Carekê, ji ber qirecira wan, ew birin ser bênderan û carê yek dixist şûna bêrgîr û bi wê cercer digerand. Lê îro rojeke taybet bû; zaroyekî pênc salî karî bû pêncî şeqemî li wî bide, bêyî ku bi wê yekê hest bibe.
Derengî şevê çavan vedike, ode bi mêvanan dagirtî ye û ev yeka jî, li gor jiyan û karên gundiyan, ne tiştekî xurust e. Ew bala xwe didiyê ku, seriyê çend gundiyên wî şikinandî ne, xasekî sipî li dor seriyê wî jî gerandine. Oda jinan jî li aliyê hewşê yê din bû, lê dengê girî û nalînên Sînema Mistê bi ser gund keti bû. Di navbera xewnekê û xewnekê de, giriyê wê bilind dibû û siwarên reşiyê zikê

wê diqelaştin, şûna dirask û neynûkên wan kûr dibûn.
19
Çilpikên xwînê li dû hev têdizên û deziyê sor şopa xwe li erdê dihêle.
Di dawiyê de, û bi lêdana tomaqekî di paşiya serî de, ew ji ser hişê xwe diçe û, mîna leylanekê, wêneya keça xwe dişopîne çawa polîsekî ew avête pêşiya xwe û zengiya hespê xwe kuta.
Civata li mala M. Keleş, heya berbangê belav nebû, çendekên ku bi banga mele re rabûbûn jî, piştî nimêja sibê, tevî meleyê gund vedigerin odê. Bûyera îro, xew ji çavên tevan revandiye; piştî xwedîkirina heft salan, keçika wê jê bistînin!! Kesî ne dikarî vê çêrokê şirove bike û ewê ku girêka çêrokê di dest de, tevî siwarên reşiyê çû bû; wan herdu destên wî xistin bendê û li dû hespekî kişandin.
Civata oda mêran bizava xwe dikir ku, dêng bi M. Keleş xîne, lê te digot qey pûtek e û li wê derê danîne. Wan dixwast ku, ew kela xwe birjîne; devê şikeft û çalên dûpişkan veke û lehiya reşiyê birjîne. Tevan dizanî ku, eger ew bêyî wê yekê ji odê der kevin, dê ezmên bi ser seriyê pîrekên xwe de bîne xwar, û nemaze bi ser serê Sînemê de.
Lê ji bilî dengê qutiya titûn û mêtina cixaran, tu livên din ji wî ne dihatin. Mele jî ne dixwast, zû zû, xwe tevlî meselê bike û ji rûmetgirtina xwe kêm bike. Lê tevî ku wî bi deng jê xwast, ka ewê çi bike û dê çarenûsa Sînemê çi be, dîsa jî deng bi M. Keleş ne ket, û piştî ku mele pirsa xwe dubare dike û bê bersiv dimîne, li wî pir zirt tê;

rengek diçe yek tê û bi bihntengî, tevî mirûdên xwe, ji civatê dikişe.
Rabûn û çûna mele û mirûdan, civat ji hev şeland û di sînora mêtina çixareyekê de, kes di odê de nema. Lê hinekan xwe li ber gedûkê giran kir û ne dûrî mala Memo
20
rûniştin. Wî jî çixareyeke nuh xisti bû nav lêvan û dimêt, çav di serî de vedibirûsîn û, mîna gayekî, çend caran bihn kişand û berda, her diçû bêvlên wî firehtir dibûn û yek çilpikên çilmê, bi berdana bihna wî re, diweşîn. Cara dawî, û bi berdana bihna wî re, deng bi ber odeyên hewşê dikeve û vegerandina navê Sînemê ji her koşekê dadirive. Dema kes ne ket odê, hêz da xwe û, bi gihîştina ber derî re, dest avêt koşa ku çovê xwe tê de vedişart û, bi qêrîn bang kir:
- Sîne… em. Sînem. Çêtir e ku tu mirî bî.
Memo bi hovîtiya xwe dihate nasîn, nemaze ji aliyê pîrekên xwe de, lê tevan jî dizanî ku, hezkirina wî ji Sînemê re bê sînor e. Ew çar salan, bê zaro, li hêviya wê ma û tu jinên din nanîn ser wê. Eger bidîta ew ji bona zarokan dêşe, dilê wê xweş dikir û jê re digot: “Helbet Xwedê dê rojekê bi riwê me ve binêre û emê jî bi zarok bibin”.
Heya roja ku ew xisti bûn cercerê, ji bona ku kes nebêje; “ji Sînemê ditrise”, hêşt ew jî seriyê xwe têxîne nîr, lê nehêşt mîna yên din cercerê bikşîne.
- Te çima li min wa kir, Sînem.
Ew di odê de mîna gayekî hêç û har diçû û dihat, tişt nemabû ku dev ji şermiyê berde û here oda pîrekan,

Sînemê ji nav koma jinên gund bikişîne û bîne odê, lê piştî mêtina ewqas çixare, hinekî hişê wî vegeriya bû û ne dihêşt ew xwe, zû zû, di şaşiyan ke.
Derbasbûna komeke jin û mêr, careke din pî û mil li wî sar kirin, lê yek caran hêrsa wî radibû û dikir rabe bi porê Sînemê bigre û vegij-gijîne, lê xeleka mêvanan li wî teng dibû û ew bê çare dima. Di dawiyê de ew dane rûniştin, kesên lê civiya bûn bi tevahî ji malbatê bûn.
21
- Ka ji min re xeber de, te çima weha kir, heft-heyşt salên tene ku tu bi min dikenî, çima… û kî ne evên alîkariya te kirine. Wî ne dît ku polîsan H. Reşo jî bi xwe re birin. Gava deng bi Sînemê ne ket, careke din har bû û bi ser de kir qêrîn, û berî ew rahêje çovê xwe, pismamekî wî gihîştê û çov ji dest girt.
- Te xêre tu har bûyî, rûmeta kesên dora xwe bigir… Ev çi maleke dîn in. Wî Memo da rûniştin û çixareyeke nuh jê re pêça.
- Ez dixwazim fêm bikim çima… Girî kete gewriya wî, giriyê mêran pir giran e û nemaze yên wekî Memo, vê yekê jî hêşt ku pîrek ji odê derkevin.
Bi rê ve, û berî ku bigihên odeya jinan, li pêşiya axurê çêlekan S. Mistê ji ser hişê xwe dere, dikeve bin baskên dêw û pîrhebokan; her hinek wê bi aliyekî ve rakêş dikin û ji dûr ve dengê keça xwe dibîse, bang û hawara xwe dike wê, lê zendine pola wê ber bi odê ve dikşînin. Piştî ku wê dixînin nav nivînan, Sînem hest dibe ku, hêdî hêdî, hişê wê vedigere û ramanên xwe komî ser hevdu dike û ew roj,

bi hemû bûyerên xwe, di pêş çavên wê re diherike.
Sibeyeke payîzê bû, piştî qehwa sibê û verêkirina mêr, wê jî rahişt fîncanan û dêng li lawkê dêmariya xwe ya biçûk dike ku here cem Esê.
- Jê re bêje xaltiya min te dixwaze.
Berî lawik ji gedûkê derkeve, Sînem dinêre ku diya wî bi destan digre û şeqamekê lê dide.
- Min ne goti bû te ku ji cem birayê xwe meliv. Bi gotinê re lêwik têvedide hundir odê û bi çavekî tijî tinaz li Sînemê dinêre.
22
Evê yekê hêşt hêsir ji çavên Sînemê bibarin. Ev deh sal in wê mêr kirî, lê hîne bê zaro bû, û her ku seriyê zarokekî bidîta hêsir ji çavan dibarî, mêrê wê her tim dilê wê xweş dikir û digotê: “Dê helbet rojekê Xwedê bi riwê me ve jî binêre”. Piştî çar salên pêşî borîn, xuya bû ku wî jî hêviya xwe ji dayîna Xwedê birî bû, û di şeş salan de, çar jinên din, tîne ser Sînemê û yekê jî berdide.
Sînem, di nîvê odê de rûniştî bû û, hûrik hûrik, lê ji cergeke bi şewat, hêsir dibarandin, haje xwe û hatina H. Reşo ya hundir tune bû.
- Xwedê xêrke, xanim, tu çima digrî. Sînem hinekî bêdeng dimîne, çavên xwe ji hêsran ziwa dike û bi riwekî nîvrast – nîvken dibêje:
- Ez zarokekî dixwazim. Pirs û xwasteka Sînemê hêşt ku devê Hemik bi du bostan ji hevdu biçe.
- Min fêm ne kir. Zaro… qey tê wî bişînî cihekî. Eger ev e.. ez karim bi wî karî rabim.

- Na.. ne ew e. Ez zarokekî dixwazim ku ji min re bêje dayê. Weke hemû pîrekan, ez dixwazim bihna zaroyan ji dawa min jî bê.
- Bes ev yeka ne ji min tê xwastin. Hemik hinekî li ber dimîne, lê di dawiyê de dudiliya xwe dibire û bi hêviyeke bilind dibêje: “Eva han li mêrê te dimîne û di dû re li dayîna Xwedê”. Bi xwêdan û çavsorî, gotina xwe bi dawî tîne.
- Dûr meçe Hemo.. mebest ne ew e. Lê di cih de li gotinê vedigere û dibêje: “Eger ez rast xanima te me û tu bixwazî ji min re biçespînî ku tu ji min hez dikî –di vê derê de, Sînem birûhan dihejîne û carekê didwan çavan
23
dadimrîne. Wê xwast, Hemik di bin baskên evîneke derewîn ke- tiwê zarokekî ji min re bafirînî.
Hemik kir ku xwe bavêje hembêzê. Sînemê jî fêm kir ku gotinên wê cihekî bilind di dilê wî de girtin, lewre, di cih de, çend bazinên zêrî ji destên xwe şimitandin û danîn pêş wî:
- Rahêje wan, ev xelata te ye û eger tu hêviya min bi cih bînî, wê hîngê dilê te di çi re hebe, tiwê bi dest xînî.
Carekê bi dizî li riwê Hemik dinêre, dibîne ku nêrîtiyê ew kûr kirî û ziman bi bostekê dirêj bûye. Guhê xwe bide min, divê çêrok ji devê te dernekeve. Nuha tiwê herî û pîrka Fat ji min re bînî. Bê erê-na xizmetkarê mala M. Keleş radibe ser xwe û dev dide mala pîrka Fat.
Bi rê ve H. Reşo bi rewşa xwe û xatûnê dirame; “ev çawa zaroyekî dixwaze û ji kû. Ma kî dîn bûye ku zaroyê

xwe bifroşe”. Dîtina ewqas zêr û bi ser de jî, bidestxistina hêviya di dil de jî, dê bihişta Hemik zaroyekî xwe bidize. Pir naçe, pîrka Fat digel H. Reşo dikevin hundir. Sînemê jî di wê navberê de karên xwe yên biçûk bi dawî anî bûn û çaydanê çayê li benda wan bû.

- Xwedê xêrke, xatûn, te vê sibeyê şandiye dû min. Pîrka Fat dipirse.

- Tu ya miraza yî, dayika Fat. Ez dibêjim Xwedê bi riwê me ve neriye û… Berî ew gotina xwe bêje li Hemik dinêre û jê dixwaze ku wan bi tenê bihêle. Piştî ew dertê, careke din dêng li pîrkê dike;” guhê xwe xweşik bide min, divê tu zaroyekî di zikê min de bibînî.

- Keça min, eger Xwedê neda, ezê ji ku bibînim. Lê gava pença zêran di dawa xwe de dibîne, bi devkenî dibêje: “gotina xatûnê li erdê namîne”. Bes tiwê çawa ji

24

Memo veşîrî, ew ne hefteyek û didu ne, divê tu neh mehan, her roj û hino hino, zikê xwe biwermînî. Eger rojekê ew bixwaze bi te re raze, derewa me dê tazî bimîne.

- Tu xeman di vî alî de nexe. Ez karim bihêlim ku ew neh mehan nêzîkî min nebe. Bes tiştê ji te tê xwastin ew e ku, tu bi riya xwe wî agahdar bikî ku ez bi du cana me. Sînem ji wê rojê de, hino hino, zikê xwe mezin dike. Roj bi roj paçikên nuh li dor nava xwe û dilê Memo digerîne. Ew di civatên gund de rûdinişt û bi serbilindî digot: “Eger mirov hêviya xwe di Xwedê ke, wê ne poşman be, va ye piştî deh salan bi riwê me ve nerî”. Neh meh kêm çend roj diborin, zikê Sînemê digehe ber

devê wê û di rojekê ji rojên dawî de, deng li Hemik dike û wî dikşîne odê.
- Çend rojên min man, de mêr be û bipirse; ka li kû derê zaroyekî nuh bi dinê ketî. Ji berî ew verêbe, Sînem çend zêran dixîne destên wî.
Piştî sê rojan ji windabûna H. Reşo, ew bi hewşê dikeve û, dûr–dûr, dora oda Sînemê temaşe dike. Gava nas dike ku ew bi tena xwe mayî, bi lez û devkenî, di pêş wê de radiweste.
- Pîroz be, xatûn, keçikeke te çê bû. Gotina "keçik" hinekî dilê wê sar dike, lê pêre-pêra germahiya hêviyan di damarên wê re diherike û dibêje xwe; "ji tunebûnê çêtir e".
- Kanî li kû derê ye. Ev keysa me ye. Ji berî ku Memo ji bajêr vedigere, gereke ew bû be.
- Belê, xanim, îşev gereke ew bi dinê keve û ji nuha ve xwe têxîn nav nivînan. Di nîvê şevê de "keçika te" digel
25
pîrka Fat dê li ber seriyê te bin. Piştî gotinê ew mîna marekî ji odê dikşe.
Di berbangê de, û li ser dengê mele, dengê lîlandin û giriyê zaroyekê, ji oda Sînemê bi ser gund de dibare.
- Zînê.. Zînê ez bi qurban. Gundîno, ez bi qurbana we bim… Ez gil-gûyê we dixum, keça min ji min re bînin.
Careke din ew bê hiş dikeve û çend pîrekên ku, li ber seriyê Sînemê rûnştibûn şerpeze mabûn; ne dizanîn bi giriyê wê re bigrîn an jî nifir û henekên xwe pê bikin.
Çend meh di ser bûyerê re diborîn. Zînê, keça heft salî,

ro ji royê dihele, ji bilî girî û xwasteka çûna ba “diya” xwe tutiştê din nizane. Çiqas bav û dê dixwastin bi wê bidin naskirin ku Sînemê ew diziye û dê-bavên wê ew in, lê gotinên wan bê sûde bûn.
Sînemê jî ji aliyê xwe ve, pir şandek û berger ji wan re bi rê kirin da ku Zînê jê re bişînin. Ji bona vê yekê jî, ew çi bixwazin wê ji wan re pêk bîne, lê şandek dest vala lê vedigerîn.
Piştî sê mehan ji wê bûyerê, û di sibeyeke buharê de, gava şîn û girî nayê bala mirov, gundê Şiyê bi ser giriyekî şîn vedibe; goristana gund goreke zarokan hembêz dike.
Cindirês - 1999
26
Serhildana Tutûn
- Hevalê Azad rexneke min li te heye. Dema kar gihişte movika rexna. Xemgîn li Azad nerî û got: Çavên Xemgîn dibrûsin, mîna yên roviya, Azad bilez kar û liva heyvekê, di serê xwe de gerand, lê tutişt nedît ku yek karibe rexnekê lê bike.
Hevalên di civînê de rûniştî tev sekinîn. Bala xwe dane Xemgîn, û her yek di serê xwe de digerîne, “Ka wê çi rexnê li xwe û hevalên xwe bike”.
- Bêje hevalê Xemgîn. Azad got.
- Dema hevalê berpirsiyar, li ser rewşa cîhanî di peyivî…
- Ê… Çi bû. Berpirsiyar xwe negirt û xwest bilez rexna Xemgîn bibhîze.
- Wê demê hevalê Azad çixareyek pêxist, lê yek neda

min. Piçekî me xwe girt, lê pêre firqînî bi tevan ket. Çav tijî hêsirin.
Berpirsiyarê komîtê xwe girt, û bi nerîneke tijî lome û olî li Xemgîn vegerand.
27
- Divê hevalê Xemgîn bê rexnekirin, û ne bes wilo, divê em biryarekê pê hildine komîta jor. Ji ber ku rûmeta movika rexna negirt, û ji xwere kir lîstik. Hevalên rûniştî, di cî de ponijîn, serî hejandin û gotin.
- Raste…!!!
Xemgîn li henekiya xwe poşman bû, lê piştî çi.. Dev ji hev vekir bo ji ser xwe bişo. Azad pêşiya wî birî û got:
- Gotina hevalê berpirsiyar di cî deye. Mixabin piraniya hevalan movika rexna ji xwere kirine henek, û divê hevalên jor li ser rawestin, bendekî ji hevalên wilo re deynin. Xwîna Misto ji van sixêfan kelî, rabû ser çonga, û tiliya xwe di ser Azad re hejand.
- Nuha tu bi tena xwe bê kêmasî mayî û dixwazî ku partî benda ji mere deyne. Ji zû de giz-giz, di nav wan de mabû. Ma çi çêbû.. wêranket bi henekiya hevalekî re.
- Çê nabe heval… ev tişt wê ziyaneke mezin bighîne karê me, em nehatine henekan ji hev re bêjin. Hevalekî li Misto vegerand.
- Çi çênabe heval, ma kevir ji mizgeftê de ket. Hevalekî li wî vegerand. Berpirsiyarê komîtê kuxî boriya gewrîyê ji belxemê paqijkir, carekê – didwan simbêlên xwe tevdan. Bi ser xwe de ponijî ku çareyekê ji vê ser êşiya giran re bibîne, dawiya dawî got:

- Hevalno… guhên xwe bidin min. Tiştê dibînim, em bûn du par; hevalên bi rexna çixarê re û yên ne pêre, û ev bû katek, em pê di axifin. Mixabin, me tu çare jê re nedît, lewra dibêjim; Em biriyarekê hildin komîta jor, bila ew çareyekê ji vê bûyerê re daxin û emê zanibin kî rastbû û kî li ser şaşiyê bû.

28

Hundir ferehbû, bîn li me derket, kulemist, nerînên tûj û bi awirên gerim ji ezmanê hundir daketin. Berpirsiyar ji min xwest, ku pênûsê têxim dest xwe û raporta jorîn binivîsim.

Raport rabû jor… jor, pelê ku raport li ser hatî nivîsandin di destan de zer dibe, kenarên pel diçirin, tîp û xêz nema tên xwendin. Ez pir serê we ne êşînim, ev raporta me gihîşt encûmena navçeya partiyê, lê mixabin wan jî tu çare lê nedît, rabûn bang li kongirekî giştî kirin. Kongir rûnişt, me herdu heval, Azad û Xemgîn şandin rêniştinê ji bo ku sibe nebêjin: we mafê me xwar û negerin nebêjin “dîmoqratî” di partî de tinebû, “Sal difirin, heyv dibezin, roj dimeşin”.

Rûniştina kongir dirêj kir, heval li ser sêla sor hildipekin, yên bi çixarê re û yên dijî wê.

Heyvek dudu çûn û heval xuya nebûn, piştî sed û bîst û sê rojan hevalekî xwe gîhande min.

- Pîroz be heval. Gote min, piştî ku xwe bi min da nasîn nîşana partî danî ber min da ku karibim bi serbestî bi axifim.

- Çi pîrozbe heval ?!.

- Kongir û nehcê hevalên me. Bi dil germî got; tîna gotinên wî niçilkê guhên min reswand. Belê hevalê delal.. nehcê rast, tim û tim wê biserkeve û roja îro..., Gotina xwe negihand serî ji ber ku deng ji derî tê û divê binerim kiye.
- Silavên germ, hevalê delal. Berpirsiyarê komîta meye, dest dirêjkir, lê dema çav bi hevalê hundir ket ez himbêzkirim û ji min xwest, em herin xaniyê din.
29
- Çima ev li ba teye. Bi zirtî gote min.
- Ew jî hevale û nîşana partî da xuyanî û em dizanin...
- Belê ev tişt me gotibû, lê roja îro nema em ji kesên mîna wî re dibêjin heval.
- Ew ji partî hatî bi dûrxistin?.
- Na... na partiya me û wî ne yeke. Di cî de dest da ser dêv, weku bê hemdî wî gotin jê hate der. Çima wî tişt ji tere negotiye:
- Min tişt fêm nekir, nizanim li ser kongir û "nehic" di axifî, dema te li derî da.
- Him... m, ji tere negot nehcê me di kongir de bi ser ket, û yên din çend kesbûn û qetiyan.
Berpirsiyar bi sixêfî gotina davêje û xwest hîn pêde here, lê vebûna derî û xwesteka wî hevalî, ku em hersê bi hevre rûnin, hiştin berpirsiyar peyva xwe bi bire.
Bayê hundir, di cî de bi dijîtiya wan qijilî. Lêvên lerizînok silavek zer li hev kirin.
Dem bû lîstikê zarokan, ji hev kişiya, dirêj bû. Min xwest perdê biçirînim û gotina ji pişt berdim, lewra min

dest bi gotinê kir.
- Tu karî berdewam bikî, ew jî hevale.
Hîna min gotina xwe negîhandibû serî, herdu heval mîna dîkan rabûn hev. Xwîn… tîr.. hovîtî.. kef û kopik ji devan di herike.
- Çime tiştên ku di kongir de bûn tu ji hevalan re danaxî. Tu hatî bi laf û derewan heval bixapînî.
Berpirsiyarê me dest bi êrîşê kir.
30
- Mîna çi, tu karî ji mere bêjî. Bi bêhneke fereh û kelî, wî hevalî vegerand. Berpirsiyar ji şêwa axaftina wî hate kelandin û bi hêz got:
- Tu karî ji mere bidî xuyakirin, çime nehcê we duruste û yê me şaşe. Lê zû-zû ew ne axifî, dest avêt berîka xwe; Pakêt derxist û yek çixare ber me dirêjkirin.
- Em û çixara ne dostin. Berpirsiyarê me got û dema dirêjî ber min kir, berpirsiyar bi çavekî perîşan û tirs li min nerî, lê wî hevalî çixareyek derxist û li pêş min danî û wilo ma, bê ku ez pêxim û hilmek kûr bikşînim.
- Hevalê delal, em kesin Polîtîkîne, em ne şervanin, ku her hevalekî şaşiyek kir, em serê wî jêbikin.. tişt nebû.. Dema ku hevalek şaşîtiyekê bike, hêdî-hêdî, yek dikare wî hevalî… Berpirsiyarê me, bi dilekî tijî ol û hesta partîwerî, gotina wî birî.
- Çi nexeme û tişt nebû, ev vegeriye ji nehcê Partî û tevgera şoreşî. Ma me tevan nexwendiye ku movika rexnan ya tewrî giringe ku dihêle hertim partî li ser riya şa… ya rast bimîne.

- Belê me tevan xwend, lê me tevan bi hev re îmzekir, ku gotinan li pişt hev ne bêjin. Eger me şaşîyek di cihekî de dît, divê em bihevre li ser rawestin. Berpirsiyar bi van gotinan kizirî, rabû ser xwe û qêrî.
- Kes nema û tu hatî ser tiştên şaş û rast bi peyivî. Tu li kûbûyî dema hevalên te xwe bi dijimin ve girêdan û destên xwe xistin yên… Lê ew heval jî rabû serxwe, û ketin xirnika hev.
- "Şerî wehşa li nav garisî me bibe". Ev metelok hilpekî serê min. Min xwest, wan ji hev dûrbixim, lê di nav wan de cilên min qetiyan.

31

Di navbera çend û çend rojan de, hevalên berê mîna mêşên hunguv û sêmsoran li dû hev dizîvirîn. Her yekî dazana Partiya xwe ya “nû” kiriye dest xwe. Partiyek bi navê yên bi çixarê re, û partiyek dî bi navê yên dijî çixarê. Ba xuşî, ewir dan ber xwe, ewrin reş… zer. Riwê zemîn bi tozê hat veşartin… şuştin û du kelem, ji yên bê-dirî, zikên axê qelaştin.

Heleb - 1991

32

Baran

Çav bi pelê rojnamê dikevin, bi gavine mirî ber bi wê ve dimeşe û peleke din ji payîza temenê riswa diweşe û bi qulbandina wî pelî re, penda wê rojê dixwîne; “Bihuşt di bin nigên dayîkan de ye”. Bê mirûz, çend caran dibin çavan re dibe û tîne mîna ku yek bixweze wêneyeke ne li bal binase û çend carine din, wê pendê û bêyî ku ew bighe

tutiştî, dixwîne. Dengê sênîkê dihêle ku, pelê rojnamê di pençê de bişke û di xalîdanka mişt de, kom ser hev bibe. Ro gihîştiye dev-devî nîvro, çend piyalên qehwê û nîv pakêtek şewitandibû, cixara dawiyê rovikên wî dişewitîne. Li ser masê dinêre ku, hîne sênîka hêkên duh li cihê xwe ye û ji her nanekî du parî weşîne. Dest davêje nanê hevala ku duh pê re bû û kûr bihin dike; Bihna biskên wê jê dihat û hevdeyeke porê wê jî li ber nanê wê ketî. Radihêje wê û tiliya xwe pê bi darve dike. Tiliya bi dardakirî li ber xwe dide û bi hejandina wê re, mûyê por diqete û dihêle hejmara tiliyên bi dardakirî zêde bibin.

Pariyeke nan dişkîne û hêka nîvşewitî dike nav.

Radihêje çaydên, hîne dagirtî ye; duh ji bilî du piyalan jê danegirt û ew hîne weke xwe mabûn. Çend pariyên hêka

33

nîvşewitî bi xêra qurtên çaya sar dadiqurtîne û dest davêje cixareyekê, xelekên dûmên mîna ewrine stewr di ezmanê odê de dimeşin.

Berve pencerê dimeşe, toz û pelên daran bi bayê payîzê re ketine cirîdê, her çendekî balîskek serî hildide, eger kesek di cadê de hebe, dihêle ew mîna mirîşkan seriyê xwe têxe bin milên xwe.

Hatina ewî kesî û sekinîna wî li aliyê din ji cadê, hemberî pencera wî, bala Diranê Pîrê dikşîne. Dîke di riwê wî dirame, ne ji yên dostê wî ye; bihna qehwê û pelên rojnameyan jê nayê û bi ser de jî, nirîna wî li çûn û hatina xelkê bê tirs e; bê şikandina çavan e.

Mirovê di cadê de sekiniye, her çendekî ber bi pencera

wî dinêre. Diranê Pîrê tiştekî nêzîkî berkeniyê di riwê wî de dibîne, bi dizî perdeya ku, carina li şûna destmala destan bi kar danî, berdide û di qurzîka qetiya re li wî dinêre; sola wî ya dibriqî çavên Dirên dikolin û cobarên qûmê jê diherikin. Di beyabaneke bê dawî de dimeşe, her diçe cobarên qûmê fireh dibin, nigên wî tê de diçin xwar û hilma germ bêvlan dikizirîne. Stêra ku xwe di ezmên de dişewtîne jî hejmara pinpinîkên kizirandî zêde dike.
Careke din di ber masê de rûdine, piyalên çaya mirdar, rojnameyine kûnde, lekên zêtê û dilopên qehwê riwê cîhana wî nîgar dikin. Baran dereng mabû û xelkên bajêr di nav pêlên tozê de difetisin, ewir dihatin û diçûn, ewrine stewir û dengê mele bi hatina ewran re tûj dibû, ew derdiketin seriyê minaran, girikên nav bajêr, ser sîng û memikên pîrekan û bang hildidan, lê ewrên stewir tîrbûna tozê pirtir dikirin.
Welatên ku bi tozê hatine pêçan û sînorkirin.. Baran jê direve, seg radibin hev û pir zaro seriyên xwe di şerê wan
34
de winda dikin, lîlandina dayîkên wan jî, pir çeman di tabûtên wan ên biçûk de derdikin.
Di welatê ku bi tozê hatiye pêçan- sînorkirin.. ji bilî mirîşkan kes avis nedibû; her diçû rengê daran zer dibû û zarok jî kal dibûn.
Kesên di bin de îro bi ser ketine, li jor – jor in. Ewê ku di rojekê de, li ser bû û pozê xwe bi wê yekê bilind dikir, ketiye bin solên wan; soline dûz û vebriqoyî, ji solên Xwedê jî mezintir bûbûn.

Jinên vî welatî ziman dirêjin, mixabin, her diçe sîng û paşiya wan biçûk dibe zimanê wan dirêjtir dibe.
Dîtina kenê zaroyekî yan nivîsandina çêrokekê; bila hezar çêrok bibin qurbana kenê Stêrê. Ew jî mîna wî biyan bû; bi hev re zoyekî beravêtî dinimandin. Di demên çûyî de, di rojên baranê de, ji mal derdiketin, çav bi baranê tijî dikirin û lêvên miçiqî avdidan. Tiliyên bê nênûk –ji zûde jê re kişandine- têve dide ber lêvên ziwa û tîş-tîşî; çend diran bi tenê di dêv de hêştine.
Ji tirsa ku ew careke din bên kişandin, nênûkên Diranê Pîrê xwe di bin ayarê wî yê kefnikî de veşartine.
Navê wî û dîtina devê wî yê bê diran, dihêşt ew bibe cihê pêkenînê; "Çawa navê teyê Diran be û diran di devê te de tune bin". Digotin û riwê wî bi xweziya ku ji devê wan dipekî, diwerimandin.
Ew du çivîkên basik şikestî bûn, per jê qurçimandibûn û mîna du mirîşkên kûntazî hêştibûn.
- "Te çima ez hêştim, tu ji min re baran, qehwa sibê û nênûkên pilingan bû. Demên tu di rex min de disekinî, min dikarî şerê xwe di keviran jî bida; ez bi ewir û segan de
35
direwîm". Radihêje piyala çaya mirdar û lekake fireh di dîwarê hemberî wî de çêdibe. Bi şikandina piyalê re, hinekî laş sar dibe, xwe davêje ser têxt; bihna porê Stêrê û baranê jê diherike, mîna segekî polîsan bêvlên xwe fireh dike û di ser nivînê re digere.
- "Te çima ez hêştim û tu çû, tu ji min re dê û dêw bû".
Welatê ku mêraniya xwe li ser seriyên cemawerê xwe

bibîne û şûşeyan di paşiya rewşenbîrên xwe de biçîne, helbet dê welatê tozê be; baran dê jê bireve û ji bilî zayîna mirîşkan dê tu tişt lê tunebe.
Diranê Pîrê di lêpirsîna ku pêre çêkirine de aşkere got: "Ez ji we ditirsim, di dinyê de tirsa min ji we tenê heye, ne ji Xwedê û dojeha wî, ne jî ji dêwên ku di devên kaniyan de rûniştine. Ez baş dizanim ku hûn karin bihêlin ku ker ji nijada xwe dagere û bêje ez kevroşk im. Ez ne li gorî hilkişandina nênûk û dirana me û ji bizavên têxistina şûşeyan jî bitirs im. Hûn çi bixwazin bila bi ya we be û kî dibêje mast ne reş e bila bê vir. Navê min jî dixînin bin konê kîjan partiyê bila bi ya we be, çend salan min davêjin zindanan ne xeme, bes min dûrî bizavên şûşeyan têvedin".
Bergerên wî bê guhdan man û heya roja îro, tevî çend sal û bijîşk di ser kişandina nênûkan re derbasbûne jî, ew di bin eyarê kefnikî de veşartî mane û naxwazin derkevin.
- "Stêr, te çima ez bi tenê û rût di vê beyabana ziwa de hêştim, tu leylana kaniyekê bû di beyara jiyana min de".
Ew ji ser têxt radibe û careke din di qurzîka perda qetiya re li cadê dinêre ku hîne ew kes di cihê xwe de sekiniye.
"Ev kî ye û çi ji min dixweze". Dema ew ji piş perdê vedigere û li ser têxt rûdine, ji xwe dipirse.
36
Bûbû çend salên wî ku reviye vî bajarî û odeyek di banê dîkanekê de kirêkirî, kesên qatên jor tucarî ew nedîtine, mîna mişkan bi dizî û di bin perdeyên şevê de ji odeya xwe bi derdiket da ku sendewîşekî an jî pakêtekê ji dikana di bin de bikiriya.

Di wê kêlîka ku, çav bi pirtûka wî dikevin, ber bi wê quncî ve diçe û radihêje wê, gava wêneyê nivîskêr li aliyê din dibîne, dêv tijî dike û goleke tufiyê di eniya wî de derdike.
- “Giş bi sedema te bû; Te hêşt ku diran û nênûkên min bên kişandin. Bila tu zanibî ku şûşe çidikin; çawa raman û baweriyan ji mêjiyên yekî hildikin. Te ji bona gewdê xwe û hembêza pîrekekê hêştibû bi sedan ên wekî min bê diran û nênûk bimînin”. Ew bi cildê pirtûkê digre û diqetîne; weşandina pelan odê mişt dike û yeko-yeko di bin nigên xwe de dişkîne, wêne û çêrokên wî dipelixîn e.
Di demên wilo de, Stêrê kela wî dirjand; bi seriyê wî digirt û dixist nav zoyê memikan, bihna binefşan ew sersend dikir û heya bi demekê bê deng dima û ji tirsa û ta ku, wan bi hilma xwe nekizirîne, wî heya bi demeke dîtir bihna xwe digirt.
- “Te çima ez hêştim û tu çû, Stêr. Ez ne yê ku, li hemberî leşkerên Sargon şer bikim. Tu ji min re “Bozê Rewan” bû; ez dûr direvîm”.
Ew radihêje pelekî şikestî û dixwîne; “Di rojeke weke îro de, Xwedê ferîştên xwe dişîne ezmanê welêt û ew diyariyên wî bi ser zarokên welêt de dibarînin û bi vekirina devên qutiyên diyariyan re, bombeyên Xwedê di laşê wan de diteqin, seriyên jêkirî hîne devliken in û cobarên xwînê.. ên, dîrokê ziwa nabin”. Bi pelê şikestî digre û davêje hundir xalîdankê; “Bese, te ez daqurdime,
37
ez pelekî payizê bûm û bi bê re difirîm, ew kuva

biherikiya ez pêre diçûm, çima tuyê min di riwê bê de biçînî. Di welatê tozê û ewrên stewir de, kê gote te ezê şîn bibim". Di kêlîka ku dike êrîşî wêneyê nivîskêr bike, ew ji cildê pirtûkê hildikşe û li şûna pirtûka xwe rûdine. Evê yekê hêşt ku hêrsê wî zêde bibe û dît ku ev yeka keyseke wî ye da ku hemû tolên xwe jê vede; erîşî wî dike. Reqiniya serî û cobarên ku di eniyê de derdibin dighên hev. Destên xwe li stûyê wî dide hev lê tiliyên wî di nav hev re derbas dibin.

- Min zanîbû tu leylan î; derewî û gotinên te jî derewên leylana te ne. Tê bîra wî ku çiqas şev di odeyên qeşagirtî ku bihna kefnikê ji koşeyan difûrî, di nav nivînên bi ken, hêsir û dilopên mîzê de, raman û çêrokên wî dicûtin. Pir caran pirtûk li eniya wî diket, ji xew şiyar dibû û careke din ramanên wî dicûtin.

Milet bi cûtina bênîşt û xwarina dendikan mijûl e da ku bighên armancên xwe di avakirina welatekî aza de û durûşma wan a yekem: Ji her welatperwerekî re tûrik dendik û qutiyeke benîşt.

- Te xêre û tu çima girî şûn de didî, ji hêsrên xwe ditirsî. Ez ne dêw bûm. Tê bîra te ku tu li ser milên min mezin bû û du baskên bazan bi milên te ketin. De rabe ez eniya te dermankim, bese tu wî serî li dîwaran didî, te tu dîwarên welêt nehêştine ku, bi lekên xwînê riswa nekirine.

Sîtila ava qeşagirtî, dihêle laşê ji hevketî di qurzîka oda lêpirsînê de kom ser hev bibe. "Min sare. Çivîkên di nav berfê de, bûn komir.. Baran dereng mayî, hinek av bidin min". Bi pana ku di nîvê newqa wî de diteqe hêsrek ji

çavên D. Pîrê dirje û dengê wî tê birîn.
38
- Ev bênamûsa çima nabêje ax?! Qey, lawê dêlan, te zimanê xwe di binê diya xwe de ji bîr kirî. Rahêjin wî û bibin odeya firandinê, bila qîr-qîrên wî guhên Xwedê qul bikin. Serok, bi hêrs, dêng li berdevkên xwe dike û bi hêrseke tûjtir, lingê rastê hildide jor û bi ser tiliyên destê Dirên ê rastê de tîne xwar; hestiyên sipî di çermê sê tiliyên wî re davêjin.
Du berdevik bi porê D. Pîrê digrin û li dû xwe dikşînin. Ezmanekî sor bi laşên çivîkan hatiye mêxkirin. Riyeke dirêj, kanîne qîr û tozê di herdu rexên rê de vedibin, çavên reng-rengî jê diherikin, mirovine stûqelaz bi dîwarên ku, di dirêjiya rê de .. daleqandîne. Kelemêşên zer ji alastina kovanan têrbûne û bi dilsarî li dor devê wan dizîvirin.
- Çi gunehên wî hene. Berdevkê oda firandinê dipirse.
- Rojnamevan e. Ew, bi sîngê pîrekan û welêt dilîze. Ev bû çend sal in em ketine pey wî, xewa pir şevan û hembêza pîrekên me, wî ji me diziye. Bi gotina dawî re paneke tijî keser li devê Diranê Pîrê dide û sê diranên wî dişkîne.
- Ez tucarî wê şevê ji bîr nakim, ez di ser sîngê pîrekê de bûm û hîne bi memikên wê şa dibûm, deng bi telêfonê ket û, bi boneya vî dêdêliyî, divyabû bêm mexferê. Eve ew ketiye nav nigên min, min bi serê bavê xwe sûnd xweriye ku vê keysê ji dest xwe bernedim. Dest davêje qayîşa xwe… Herduyên sekinî jî kenê xwe bi kûna wî ya werimî dikin. Bi rabûna berdevkê oda firandinê ji ser pişta Dirên

xwîn di paşiya wî re davêje.
- “Te çima ez bi tenê hêştim, tu çû û te baran jî bi xwe re bir. Cadeyên bajêr dengên solên me nasdikirin û hîne li pir kolanan dengê kenê te difire”. Wan çiqas kolan û cadeyên bajêr hene, gav bi gav, pîvane. Destên xwe
39
dixistin ên hevdu û didan dû lîskên baran û çivîkan, heya bi derpiyên wan ên binî dihatin şûştin. Pir caran dilopên baranê ji ser lêvên hevdu didizîn û piştî tazîkirin û demeke dirêj, di nav nivînan de, hevdu ziwa dikirin.
Çima zaro dizên. Kuştin û gorandina mirovan fireh dibe; Ezmanekî nuh ji welêt re gereke, nema perispan bi kêrî yê berê tên û çermên ên gorandî hîne çend perçe bi hev nexistine.
Diranê Pîrê wêneyê dest xwe davêje, dilopên xwînê tu dever nehêştine ku pê nehatine riswakirin. Radibe ser xwe û ber bi quncikê ku kiribû xwaringeh diçe, henefiya avê vedike; bablîsokeke tozê jê diherike. Radihêje paçikê paqijkirinê ewê ku Stêr ê ji ê kurtikekî xwe yê kevin qetandibû, û di der-dora birînê re dibe û tîne.
- “Pîvaz derman e”. Pîra Zîno pîvazeke ji mistekê dipelixîne û datîne ser eniya wî; “Meymûn, te li piş kerê çi dikir”. Çend pîrekên rûniştibûn çavan dikin hev û kenekî toxmî li ser wî dibarînin; “Evqas pîrekên birçî di gund de û tu derî piş kerê, wê tukêmasî nekiriye dema eniya te şikandî”. Diya wî bi riyên xwe digre û wî li dû xwe dikşîne mal.
Kesê di cadê de sekiniye, hîne di ciyê xwe de maye,

Diran bi dizî perdê ji ber çavên xwe yê werimî bi dûr dixe; “Rûyê mirovan wek hev in lê ew bi solên xwe ji hev cuda ne”. Sola wî di bin tîrên demsala payîzê de dibrûsin.
- “Solên wan jî mîna rûyên wan dûz û paqije. Ew çawa, zû-zû, karin lekên xwînê û perçên eyarên mirovan bişon?!. Qey ew gihîştine tiştekî ku, karibe her lekeyekê bişo, heya hêsrên mirovan jî ziwa bike”.
40
Soleke fireh bû, têra welêt tevî dikir; bajar û kesên wê, tevî mizgeft û cadeyên bajêr, ezman û barana reviyayî, zarok û çivîkên serjêkirî, evîn û yaran.. Xwedê jî dikarîbû ji xwe re cihekî di wê solê de bibîne.
Wî davêjin hembêza solê, nigên wî mîna benikekî rizyayî di du qulikên solê re dikşînin, ji xwêdan û lekên xwînê, eyar bi çirandina pantiron re diterişe û weke du guhên bel bi eniya solê ve li ba dibin.
- Ev çovên di ziraviya tiliyên wî de we dîn e, divê weke stûnê nîvê konên koçeran, di bin nigên wî de stûr bibin. Enî, zik, çav.. nebêjin ev der bive ye em lê nexînin. Gereke ew bêje: Ax, ew bifire û qêrîna wî bighe serok”.
Berdevkê odeya firandinê dibêje herdu berdestên ku Diran anîbûn, û tiliya xwe berve gurzeke çovên hinaran ên ter dirêj dike.
- “Çerm û hestî yên me ne û goştê wî yê te ye”. Bav dibêje mamoste û destê zaroyê xwe dixe nav lepên gur. Xwêdan di ber nigên herdu berdestan re davêje û yek dilop jî ji banê oda firandinê diweşin.
- Kurê segan, çima deng ji te nayê. Dergevan dêng li

berdestekî dike ku devê wî veke û zimên bikşîne. “Çima li derve zimanê we dirêj e û hûn bes dighên vir, hûn di paşiya diya xwe de ji bîr dikin”. Şivika hinarê ya ter di zimên de dûz dike û nîvbirî dike, çend dilopên xûnê dipijiqin ser rû û solên wan. “Tufî, çi xwîneke pîs e… Lawê dêlan, bi hezaran ên weke te di vir re derbasbûne û tevan bi zimanên xwe solên me alêstine. Wan ji bo cixareyekê derpiyên pîrekên xwe ji me re sistkirine. Qey tu ji tevan çêtirî”. Kuzotên êgir di kezeba Dirên de vêdikevin û guloverên sor ji çavan difûrin; di wê baweriyê de ye seriyê wî qelaştine û komeke kuzot avêtine nav
41
mejiyê wî. Ew piştî demeke dirêj pê hest dibe ku hêlika wî ya çepê perçiqandine. Qîrîn û hatina serok dighên hev.
- We sipas dikim. Wî vegerînin oda bi tenê û herin solên xwe paqij bikin. Ewî got û bi hêmeneke sar cixare xist devê xwe û bi xweşî nefes berdan.
- “Tu ji min re derya şîn bû û çavên te du kelekên şikestî bûn, ji mêj ve li kelekvanekî digerîn”.
Di rojeke payîzê de -demsala herî bi tenê li welatê tozêdi demên ku hîne yek ewir baranê di ezmanê welêt re diborîn, Diranê Pîrê sîngê xwe ji tava baranê re vekiribû û dabû dû dengê lehiyeke ku di bin erdê re diherikî. Ew jî bê sîwan li ser riya zanîngehê bû. Çend şofêrên servîs, zemûr û dilên xwe jê re vekirin, li şûna ku ew destên xwe bavêjin fîtêsê, gunên xwe yên werimî misdidan.
Keçeke dirêj û zirav e. Porê wê yê reş û baranê ketine cirîdeke rewan; ka kî dikare bêtir rêşiyên xwe bi ser pişta

wê de darivîne. Çakêtê cild û pantironê cênz nikaribûn rê li ber şilbûna derpiyê wê jî bigrin. Mîna geyîkeke asê serî hildaye, her çend gavan, carekê xwe bi banî de çen dike û şiqinên darên di ser rê de dihejîne; dihêle misteke din e baranê bi ser de bibare.

Baranê bibar bibar
Delalê bibar bibar
Qirika genimê me xwar
Sêwîka serî yê hev xwar

Hezar şev û şiv ji bo misteke goşt û gurzeke por dişewitand. Pir şevan, piştî demeke dirêj û bê xew, di nav nivînan de dipirpitî, ewkê xwe diguvaşt û xweziya di

42

tîrbûna mêst de tufî kefa dest dike, hezar zinar ji ser pişta wî diherikîn.

Kesên bajêr bûne du perçe; perçeyek bi xwe û "kenê şeytên" de ketî û yê din bi dûketin û binçavkirina vî perçeyî mijûl e.

Dîtin û naskirina keçikê ku, li kîjan fekûltê dixwîne hêştine Diranê Pîrê ji mamosteyekî bêtir li zanîngeh û çayxanên wê bête dîtin. Tiştê din ku dihêşt ew bêtir li wan deran bête xûyakirin, naskirina hinek şagirtan jê re û her diçû ew bi gotina; "mamoste" diwerimî. Lê evê yekê jî nedihêşt ku ew, mîna zaroyekî, li pey Stêrê, di nav riyên gulîstana zanîngehê de, nebeze.

Ewqas roj, hezkirin, cûtina gotinan û qîr-qîrên wî di civatên bi xwe re, eger di heyameke sayî de rastî wê bê dê bi geza sîngê gihîştî bixwe, devê tijî gotin vala bike û

zimanê ku ji hezar salan ve pûçbûye bike lîp-lîpokê maran. Lê gava Stêr di jorî wî re disekine, mîna mêxekî bi danîştokê ve tê mêxkirin.
- Ezê heta kengî di jorî te re bisekinim û tu yê nebêjî min keremke, rûne. Hin caran ez dixwezim ez kilasîkî bim û law bidin dû min, ez cihê dilxweziyên wan bim. Keçika por sûlav rûnişt û gotinên xwe ji xwe re, ji masa ber wan, ji wî û dîwarê çayxana zanîngehê re, ne ji kesî re digotin û bêyî ku ew çavên xwe ji kitika ku, dide dû pinpinîkê bibire, careke din, deng pê dikeve: “Ew girt, biner çawa pê dilîze û herdu jî bi vê yekê şa ne”.
Bûdeliyeke fireh bi qasî riwê Dirên li ser rûdêmê wî belav dibe û berkeniya wî ya zer hîne bêtir beloq dike. Ev hest mîna eyarê wî bi canê wî ve digre û her diçû kûr û kor dibû, ew jî pê re biçûk û qelstir dibû.
43
- Tu nuha ji xwe dipirsî ka ev çi keçeke aza ye. Bi şêw û durvê min nexape; ez bi vê yekê qelsiyên xwe vedişêrim. Lehengên ku em wêneyên wan bi sîngê xwe, ên odê û welêt ve dadileqînin, ji hemû aferînên Xwedê tirsoktir bûn; bi boneya ku tirsa xwe veşêrin û kes riwê wan ê zer-beravêtî nebîne, ew derketin jor. Çima tu cêntilman dernakevî û naçî qehweyekê ji min re nînî, te hêştiye ez baxifim, gewriya min ziwa bû.
Bihina qehwê û kişandina cixareyekê sîngê wî û nîgara çayxanê fireh dike. Ew bala xwe dide tiliyên top yên ku cixare di nav de natebite û tê derdixe ku ya li hember wî rûniştî yeke agirnok e.

- Te negot ka ez çi dixwezim. Çima gava hûn bi pelan re rûdinin, gotin di mejiyê we de li hev dixurcilin, her yek ya din têve dide da ku ji berî wê derkeve, lê gava hûn bi yekê –ji me- re rûdinin, hûn dibin kewê Evdel. Min jî weke pelekî li pêş xwe bijmêre û gotinên xwe bi ser min de velûke. Gotina dawiyê, hinekî madê Dirên li hev xist; Tu çima zer bû. Qey hestên te evqasî tenikbûne. Ev tişt di nivîsandinên te da netê dîtin' nivîsandinên te tijî kêz û kurm û verîşî ye.
- Ez naxwezim ew bighên fincana mina qehwê û riwê te. Ji bo pirsa te jî; ka tu çi dixwazî. Eger ne îro be, siba tuyê ji ber xwe bêjî, tu çi dixwezî.
- Tu ji xwe razî ye. Tu di wê baweriyê deyî ku emê siba jî hevdu bibînin.
- Çima na. Keçik fincana xwe dide aliyekî û ji ber masê radibe, sipasiya wî dike û ji çayxana zanîngehê dertê. Roja din, hine zaro li ser riyên dibistanan tiliyên xwe yên zirav misdidan –da ku karibin di bin çavên mamoste
44
de xwe ji hev dûr nexin- deng bi deriyê wî dikeve; "Ev çend salên min in ku min ev odeya ser dîkanê kirêkiriye û min hîne negotî tukesî: "Kî ye evê li derî dide". Bêyî ku bighê û çavan bişo, berve derî diçe.
Bihna gulan û keçikan buhşteke bê sînor e. Dîkê ku, li ser sêrgo jî bangil dide, bihuşta xwe bi ya Xwedê naguhêre. Vekirina derî dihêle baxeke gul derbasî odeya wî bibe. Ev cara pêşî ye bihna gulan ji odeya xwe dike. Wî ji zû de, carekê, gulek kir dest xwe û ji keçika ku, di

balkona hemberî wî de disekinî re anî, lê dema xwast jê re bavêje, keçik reviya û bi tirs deriyê ser balkonê girt hêşt ku Diran rahêje soleke xwe ye kevin, bi dîwarê odê ve daleqîne û ewê gulê tê de biçîne. Ew roj- ev roje ku, careke din ber bi firoşên gulan ve binêre.
Bazirganek gulên bajêr tevan dikire û li ser riya firoşgehê û hotêlê rêdixe da çavên wî ji bilî gulan tutiştî din nebînin û gava dilbijek dest davêje gulekê ji wan gulan ku, diyarî dilbera xwe ke, sê tiliyên xwe di nav baxê gulan de winde dike û dilopên xwînê ji gula sipî dadirivin. Hejmara bazirganan kêm dibe û yên kûndeyan her diçe zêde dibe. Ew bi hemû tiştên dinê mijûl dibin; dikirin û difroşin, mirovên reng-rengî, ji cotar û mamosteyan, nivîskar û qewadan, mirîşk û roviyan.. hemû tişt di çarşiya wan de dihate bazarkirin. Rojekê bazirganekî gurzeke kilît kiribûn dest xwe û di nîvê bazarê de bang dikir; “Werin kilîtên bihuşta Xwedê”. Eger wî bixwesta karîbû bi guhên Xwedê jî bigirta û baniya li bazarê bifrota.. Lê camêr hinekî rûmeta xwe digirt.
- Ez ji te hez dikim. Bi baxê gulan re, hevoka çûye diyarî wî dike û dihêle Diranê Pîrê têkeve bin xeyalan, çavan bikole. Lê ew e; keçika duh e û li ber deriyê wi ye,
45
ne di xew de dibîne. Bi vekirina destan re, Stêr xwe davêje hembêza wî, hêsrên Dirên bi porê wê yê reş re dikevin cirîdeke rewan; ka kiyê berî yê din xwe bighîne sîngê wê; gelî û herdu girên dorê avde û bihêle şînkayî, bê tirsa ji tozê, serî hilde.

- Ev bû çend rojin ku ez ji bo te li zanîngehê dewamdikim. Keçik dikene; tu bi min dikenî ku ji bona keçeke di temenê zarên min de, digrîm.
- Na, ez bi xwe dikenim ku çawa, her min dikir ez bêm cem te û bêjim; Ez ji te hezdikim, kabokên min sist dibûn û dilê min mîna çivîkeke serjêkirî di sîngê min de dipirpitî. Vê yekê dihêşt ku, ez ji xwendin û dostên xwe, ji dê û bav… ji hemû tiştî birevim odeya xwe û derî li ser xwe bigrim da ku, karibim bi rihetî bigrîm, heya gihîşt vê rojê ku hêsir di çavên min de ziwa bûne. Çima ez zû nehatim.
- "Tu dereng hatî û zû çû, Çima". Bê hest li ser dêv ketiye û çend mêşên zer berî devê bi xwîn kirine. Dema cerdûn pelika guh jêdike, ew bi zorê di qurzîka çavê werimî re li wî dinêre; "Ez karim ya te fêmbikim ku tu ji birçîbûna re guhê min gezdikî. Eger ez li serhev bama û min tu bigirta, minê tu bi xwara. Bes ka bêje min, çima evên din dixwazin, hino-hino, çinîkên goştê min biqetînin bêyî ku ew birçî mabin". Wî xwe bi dev cerdûn de berda; Erê carekê ji carên girtinên wî, ew xistin korta avrêjê û heya ber bi dêv jî gû bilindbû û cerdûnan ji vir û wir êrîşî seriyê wî kirin û pir şan, heya bi nuha jî, jê re hêştine. Lê îro ev cerdûn li ber dilê Diranê Pîrê dostekî pir zîzbû; aferîdeyekî din, du çavên din di wê valahiya beyabûn ê de dilivîn û tenêtiya wî û bê dengiya zindana wî dişkand.
- Tu dizanî ku cîhan bi qaliqê pîvazekê ye, kûndeyek e; her rojekê di hembêza yekî de derbas dike û koma qoqên
46
zaroyan bilind dibe û dibe. Ez zanim ev nirîna te ya bi

qehir ji bo çî ye; çima ez hişê xwe naxînim seriyê xwe, çiyê min ji azadîyê heye, ew ne dê û yara min e, ne jî ewrekî baranêye ku, stûyê min di bin de bişkê da ku wê bi ezmanê welêt ve girêdim. Erê ez vê dizanim û bi şev û roj min digote vî seriyê hişk lê tutişt pêve nediçû; tiştekî nedîtî, êşeke zirav di nîvê dilê min de nedihêşt ku ez ji bo azadî, welêt, baran û Stêrê nestirêm. Tu yê çi bêjî, ez mirovekî sersam im, bê hişim.. bes ne bê rûmet im û eger tu bawer nakî ji segên berdayî bipirse. Erê min pir sîng mêtin, destên min ketine bin pir derpiyan û heya keçikên ku, nuh seriyê gupikên wan di pişkivîn jî min gezkirine, bes dilxweşiya min ewe ku, min ev giş bi hezkirineke sayî û dilsoz dikir.

Kûndetiya mirov ew e ku bê hezkirin meya sîng binoşê, belê ji wir tê.

Diranê Pîrê dûr difire; ezmanekî bi ewrên tozê dagirtî, çivîkên serîjêkirî bê rênasîn di nav de difirin û segine bi baskên xwe yên pola wan niçîr dikin. Ew di nav gulîstaneke mîrî de dimeşe, gul, binefş û nêrgizên rengrengî ku di qoqê mirovan de çandine, dora qesra mîr dixemlînin û zurbeya segên ku qesrê diparêzin bi hestiyên wan dilîzin û dalêsin.

Zaroyên mîr jî, qoqek kirine gokê lîskê û davêjin hev.

Çar hezar pîrekên mîr, li benda wî, şevên payîzan dêjmêrin. Lê riya wan dûr e; şeva ku wî di nav nigên xwe de, mîna segekî ku xwediyê wî hestiyek avêtibe pêş, bibînin, nedihat.

- Jiyan xew û xew e, divê milet hertim di xew de be.

Em xewnên sor, aravî û reng-rengî ji we re dixwazin û em ji bo xew û xewnên we xew nakin, bi şev û roj dixebitin da
47
ku em xew û xewnên we biparêzin. Ê ku şiyar bibe, emê çavên wî biperçiqînin, birjînin; ne ji ber ku ji lêdan û hingavtinê hez dikin, em nekesine Sadîst ne. Em wilo dikin da ku ew di xew de bimînin û xewnên reng-rengî ji dest wan neçin. Ma yê ku, tim û tim di xew de be dê bi çavan çi bike, ji bilî toz û şelmûtê bên tijîkirin, çima ewê çavên xwe bi beyaban û ziwakirina mirovan bêşîne. Qey hîne hêsir di çavên we de mane da em ji we re ziwabikin. Gava deng bi kesî nakeve, serok bi pozbilindî dide pêşiya berdevkên xwe û ji ode ya miriyan derdikeve.
Şiyar dibe, nîvmirovek mayî; destê rastê pûcbûye. Pêşî gumankir ku ew xistiye bin seriyê xwe û wa xewa dirêj, mîna ên şikeftê, hêştî pûç bibe. Lê dema dît ku ew ji gurmikan ve dileqe zanîbû ku hatiye hilkirin. “Mirov bi destekî jî dijî. Erê ez nizanim bi yê çepê binivîsim, lê ne piroblemeke mezin e, di çend rojan de ezê hîn bibim. Wan gote min ku, destê rastê pîroz e. Diya min jî ev hevok, bi şîrê xwe re, berdabû damarên min. Lê ezê ji vir û pêve bikim ku yê çepê jî pîroz be. Ma qey nîvê çepê bi destên Iblîs afiriye”. Rabûna wî ya ser-xwe, dihêle cerdûn xwe di korta avrêjê de veşêre. Cihekî çarkoşe ye, mitro bi mitrokîye û banê wê ne jê bilintir e, di nîvê wê de qulika avrêjê ye; Di rojên çûyî de ew negerek wî bû, heya bi sola wî ya bê benik jî tijî xûn û gû bûbû û bi kêra berberan jî ta nikarîbû cilên wî jê bikrana; ji gilîz, xûn.. û gû, ew pêve

bûne şima.
Ew destê xwe yê çebê dide bin henefiya avê û gava dixwaze rûdêmê xwe bişo, tiliyên wî di qevîştek û kortan de winda dibin. Hin birînên laş hîne xwîn jê dixilxile û hinek jî ji demeke nêzîk ve dev miçiqîne..
48
Çend çilpikên xwînê di korta avrêjê werdibin, destê çepê davêje bin guhê xwe ku nîviyê wî firiye. Wî dikir ku hinek lomeyan ji cerdûn bike, lê vebûna derî û reqîniya ku, bi eniya wî dikeve hêştin ew lomeyên xwe bide şûn.
- Tufî. Bihna te ji ya avrêjê genîtir e. lawê kûndê. Qey te xwe neşûşt. Wî bizavên xwe kiribûn da xwîn û gûyê hişk ji xwe bike. “Xelk gûyê hişk jî bi me re ve dike”.
Dema ew ji bapîrê xwe dipirse dê; çawa yek karibe wilo bike, kalemêrê rihsipî xwe rast dike, tu dibêjî ku qey ew ji hezar salan ve li wir danîn e da ku wê pendê şirove bike; “Kurê min, ji bo ku bi teve bikin ew dikarin gû di devê xwe de bicûn û pur ser yekî kin”.
“Wan gûyê min bi min ve hişkirin e bapîrê min, û me fêmkir ku, ew karin gûyê hişk bi me ve bikin. Ma ne divê rê jî hebe ku, yek karibe ji xwe bike”.
Ji wê rojê de, Stêr her roj mêvana wî bû, bi dizî dikete odê û bi dizî jê bi derdiket. Hatina wê, di devên xelkê bajêr de, bû çêrok. Mêrên wê cadeyê, di xewnên xwe de, yek li dû yekî bi Stêrê re difirîn û postikên xwe yên kefnikgirtî dişewitandin.
Ew dikeve pêşiya şandekê serok û di riyeke dirêj, di nav odeyên girtiyan û xewnên wan ên vemirandî re,

dilezînin. Di navbera her çend gavan de, panek li kerika kûna wî dikeve; “Eger te dît panek di pişta te de derbû, zanibe ku tu yê pêşî yî”. Kenê wî dihêle şandek hartir bibe û bi ser lêdana panan de, bi çend gezan, birînine nuh di pişta wî de der bike.

- Keremke mamoste, rûne. Derbasbûna ode ya serok û dengê wî dihêle ew derbasî cîhaneke biyan, dûrî rewş û sincên zîndanê, bibe.

49

Bi gotin û şana serok re, xwe dide ser danîştoka di hemberî masa wî de; di nîvê odê de û dûrî masa wî bi çend gavan di danîştokê de dibe qufik. Piştî kurte demekê û bêdengiyeke bê dilovan, çavan li derdora xwe digerîne. Cara pêşîn çav bi keskayî û guline reng-rengî dikeve. Dawiya dawî ber bi cihê serok dinêre, maseyeke di rengê qehwê de, li ser wê pir dûsê û pênûs danîne. Kesê di piş de rûniştiye pêncî sal derbas nekiriye, riwekî paqij û bê tirs, li ser lêvên wî bermayiya maça pîrekekê, ku hîne ziwa nebûye, dibîne.

- Tuyê cixareyekê bikşînî. Bi gotinê re radibe ser xwe, radihêje qutiyeke bi zîv nîgarkirî. Dema devê wê ji hev dike, mûzîka cejnên sersal û zayînê jê dadirive û bi hesteyekî zêrî, cixarê jê re pêdixe. Piştî kişandina çend gulmên dû, serok bayekî reş ji ber xwe berdide û çend laşe di odê de şîn dibin. “Pênûsa te bi te re ye”. Pirsa serok dihêle D. Pîrê pênûsa xwe bide dest wî. “Te bi vê pênûsê, ew gotar nivîsandin e”.

- Kîjan gotar. Pirsa Dirên dihêle riwê serok bête

guhartin.
- Lawê dêlan, ezê nebêjim kîjan gotara. Kulmekê di devê wî de diteqîne û dihêle çend diran ji dêv biweşin; “Dema nuha ez pênûsa te di kûna te ve kim tiwê zanibî kîjan gotara”. Qêrîna wî deriyên dojehê li ser Dirên vedike û sê segên berdayî êrîşî ser wî di kin; bihna xwînê wan bêtir har dike.
- Ew çavan di odeya nuh de vedike, hersê segên berdayî westayî ketine. Dîwarên odê ji lekên xwînê û perçeyên eyar û mûyê mirovan hatiye avakirin.
Riya bihuştê di nav nigên pîrekê re diherike, deriyê dîrok û azadiyê ye. Dema tukes, rê û bawarî bi kêrî wê
50
netên, ew destê xwe li nav nigên xwe dixe û dibêje; “Tu dergeha jiyanê yî”.
Stêr dide ser riya zindana ku, Diran têde hatî binçavkirin.
- Te çima ez buha kirîm û xwe erzan firot. Dibêje wê û seriyê xwe dixîne hembêzê. Giriyê wî kaniyên ziwa derdikin.
Dengê zemûra tirumbûla serok, Stêrê ji ezmanê wî tîne xwar. Ew bi tenê, di odeya ku cobarên tozê tê de derdibûn, hêştin.
Ber bi perdê dinêre, bi nirîneke xemgînî lê bê tirs li wêneya wî dinire û ber bi pencerê ve dimeşe, perdeya ku, kefnikê serî tê re hildayî diqetîne, bi bazinê pencerê digre û wê li ser asoyekî ku, bi ewrên baranê dagirtî vedike û hêdî-hêdî dengê wî bi stiraneke zaroktiyê re bilind dibe:

Dê wernê lê baranê
Baran barî bi zimbîla
Zikê erdê kir mîla
Xalî li ser ê ……
Cindirês 1999
51
Tenê Ew Dar
Ji xew şiyar dibe. Reşiyê ode pêçayî, cara pêşiye ew dinase ku reşî dikare evqasî tîr bibe. Bi dizî, carekê - dudiyan, çavan vedike. Ew baş dizanê, eger ku bi temamî çavan veke dê nema karibe heya bi çend katên din jî xewke û ji tirsa ku xwêdan li wî sar nebe û bayê sar, ji der ve, nekeve bin mitêla wî û arsimî nekeve, newêrîbû xwe bilivanda.
Evan tevdîran tevan jî nehêştin ku xew ji çavên wî nereve û dema dibîne ku rûdêna wî werimiye, ji nav nivîna derdikeve.
Tîrbûna reşiyê jî herdiçû zêdetir dibû û hestek bi wî re çêdikir ku ew ji çavên wî difûre û dihêle ku vê yekê bike sedema nadîtina gewdê xwe.
Ber bi kepînê derê. Sekinînên wî yên di hundirê wê de û di demên ku ew dimîza, hertim gotina serleşkerê wan dihate bîrê; “Divê hertim seriyê we bilind be, heya demên ku wîn diçin destavê û dimîzin jî, divê wîn li nav gunên xwe nenirin, gereke serî û pozê we bilind be û nirînên we li asoyên dûrbin. Ne xem e eger ku dîwar jî hebin dibe wîn dûr binirin”.
52

Ev gotin digel bûyereke din, ji jiyana wî ya leşkerî, hertim dihate bîra wî ku çawa di rojekê ji rojên fêrkirinê, û piştî çend kat û derbûna cobarên xwêdanê di eniyên wan de û di bin tîrên roka tîrmehê de û bi boneya ku ew bi derengî hînî agahîyên serleşker dibin, wan bi dêv davêjin erdê û ji wan tê xwestin ku xwe weke kuriyên buharê, di axê de, bigevzînin. Û bi bîrhatina gotina wî ya ji berî demekê; “Gereke hertim seriyê we bilind be”, ew xwe ji bîr dike û li şûn refê hevalên gevizandî dimîne.

Bi pana ku li gurmikên piyan dikeve, ji nav rêf tê avêtin û ew hêsra ku tê xwar û bi qasî teneyeke nîsk axê dikizirîne dihêle lehengiya ku ji xwe re dixwest riswa bibe, û ew ji binî ve biherife.

Di avdestê de destan davêje dêxûna bêceme û bi destketina bê re dihêle ew veciniqe; “Qey ez xewnekê dibînim”. Ev pirs dê bihêle ew li gewdê xwe bigere lê gera wî bê havil bû, herdiçe baweriya wî bêtir dibe ku wî gewdê xwe winda kirî û ew ne xewnekê dibîne; “Min ji zû de xewn nedîtin e”.

Ne ku wî her tiştek got gereke em jê bawer bikin, ji berî çend rojan wî xewneke din bi wan dîtibû, lê nedixwest wê bîne bîra xwe. De ka em vegerin û binirin çi bi gunên wî hat; dikin biteqin û herdiçû ew diwermîn, di zikê wî de mezin dibûn.

Çend carên din destê xwe davêje wan lê hertim bayekî reş dikeve nav tiliyan, ji êş û jana wan re kir ku biqîre lê ew bi behaneya tirsa ji cîrana ji wê ramanê digere; “Ewê derkevin devê penceran û li min binirin, bê ku tu tişt hebe

ew çavan ji min nabirin, tu dibê qey tukarî wan, ji bilî çavdêriya min, tuneye. Ne ku ez hîne di vê tariya tîr de
53
biqîrim, dê ji wan re bibe derfetek ku pozên xwe têxin hundirê avdestê jî. Bila ew di donê xwe de bişewitin”.
Di vir de jî wî nerast digot, tucîran li dora wî tinebûn; ji roja ku xwe di vê buhuştê de dîtî ji bilî xwe hîne rastî tukesî nehatiye. Ew bi şîrê deveya ku di jorî xwe de dîtibû mezin bûbû û bi vexwarina ava Kaniya Sipî jî ziwabûna xwe vedimrand û li ber devê wê jî cihek ji xwe re dûzkiriye, xew û xewnên xwe tê de dişkîne lê wî tucaran bihna yekî weke xwe li wan deran, hîne, nedîtiye.
- “Tu kiyî, her ku min tiştek got tu min virek dertînî û tu dixwezî ez li gor dilxweziyên te bijîm, baxifim, rabim û rûnim. Te a nuha cixareyek pêxist û tu dixwezî dûyê xwe têvede gewriya min, min hîne ew nedîtiye û ne jî ez dizanim cixare çiye û ji çi çê dibe û ji berî ku tu mîna hercar direvî ramaneke din gereke tu evê yekê baş nasbikî ku; ev jiyana min e, erê te ez afirandim û ji min re got: “Bibe” lê ezê li gor zanîn û viyana xwe bijîm, min dixwest ez li gor evîna xwe jî bijîm lê ew bi dest min neket”.
Pîr Rustem ji cihê xwe tê avêtin; kiye evê bi wî re daxife. Ew çend caran li dora xwe dinire û li xwediyê dêng digere lê ji berî ku ji nişkabûna xwe şiyar bibe careke din dengê wî dike; “Tu li çi digerî, xûya dike ku vê carê sîbera te donxizî bi te kiriye û nehêştî tu tê bighî ku lehengê çêroka te daxife”.
Ew bi gotina wî ya dawiyê re pênûs ji dest xwe davêje

û ji pelên sipî direve lê gotina pêşiyê rijîbû û pêvajoya jiyana wî hatibû nîgarkirin û hêdî-hêdî, pelên sipî bi lekeyên jiyana wî reş dibûn.
- “Tu li wan deran çi dikî, te çima destên xwe xistin wê derê”. Ewê di buhuştê de, li ser şopa dêng dimeşe û ev
54
cara pêşiye ku dûrî Kaniya Sipî dikeve, xwest ji wî bi pirse, ka tuçare li ba wî hene ku hinekî guvaştina gunên wî kêm bibin û tîrbûna reşiyê jî hinekî tenik bibe. Lê kenê wî yê bilind dihêle pirsên wî birevin û, careke din, ew bi xwe dikene; dema ku nepirsîn a xwe, bi çavdêriya cîranan û da ku nizanibin gunên wî werimîn e, bincil dike.
- “Tu ji ku ve dizanî ez bi çi diramim ta ku tu nirînên xwe li ser ava dikî”. Pîr Rustem xwest bersiva xwe bide û jê re bêje ku tusûcên wî di vê yekê de tineye û wî pênûs ji destê xwe avêtiye û ewî ji ber xwe jiyana wî nîgar dike, lê turê ji bilî pênûs tunebûn ku bi lehengê xwe bide naskirin û ew jî ji destên wî derketibû.
- “Ezê nehêlim ku tu di nîvê rê de dev ji min berdî. Pênûs jî yê te ye û depreş jî û tu dikarî fermanan bidî wan, te carekê got; Bibe û ez bûm û çêrok ji dest me bi derket”. Dengê kenê wî dihêle ew careke din bide dû şopa wî; “Ev bû çiqas û ji kengî ve di vir de dijîm û ez, ji bilî carekê, wiqasî ji kaniyê bi dûr neketim e. Wî gotibû min ku ji bilî Kaniya Sipî jî, çemên mey û hunguv jî hene, û kanî min tucarî dengê wan pêriyên, ku di sayîbûn û vebriqîna tariyê de jî, nekirîye”.
- “Tu yê nuha wan bi bînî, eger ku weke ez ji te

bixwezim tu bikî û gotina min li erdê nehêlî". Xwediyê kên dêng lê dike.
- "Tu çima herçendekî dengê xwe diguhêre, ez ne serxoşim da ku dengên te yên reng-rengî ji hev dernexim". Xwediyê gunên werimî vadigerîne û şopa wî dengî dajo. Bi dîtina wê re, tarî hinekî zelal dibe; yeke wek wî ye, ji bilî hinek tiştên biçûk, tucudayî yên din di navbera xwe û
55
wê de nabîne û cara pêşiye ku dinase tiştek di sîngê wî de diwerime û deng pê dikeve.
- "Ewe.. ew dikare çareyan ji pirs û gunên te re bibîne". Ewa ku xwediyê kên li ser dipeyive, xwe li bin dara sêvê dirêjkiribû; "Wîn ê anuha berê wê bixun û şerbeta jînê nasbikin".
Ji berî ku ew geza pêşî lêxîne tê bîrê ku carekê "dêng" bang lê kiribû û, piştî ku rêça wî ajotibû û hatibûn li bin vê darê sekinîbûn, jê re gotibû; "Her tiştên vê derê ji te re ne lê tenê ev dar çênabe ku tu nêzîkî wê bibe, ew ji bo xwarina min e".
- "Tu guh nedî gotinên pêşiyan, eger ku tu ji wê darê nexî, hêlikên te dê te bixun". Bi xwarina sêvê re çemek ji nav gunên wî diherike. Ewa, ku li bin darê jî, direve aliyê din û bi pelekî tiwiyê nav nigên xwe vedişêre.
- "Min ji te re negot; ev dar ji bo min tenê ye û çênabe tu jê bixû. Te donxizî bi min kir û bawer neke ku ez careke din xwe bidim dest te". Ew dinire ku Ejdeha ji koka darê dertê û xwe di qulekê de vedişêre, bi veşartina wî re marê di nav nigên wî de diwerime û dirêj dibe.. dibe û ber bi

cihê ku ewa xwe bi pelê dara tiwiyê veşartî dixweş e. Hêdî-hêdî çavên wî vedibin. Neraste, tucarî çavên wî negirtîbûn, lê tîrbûna tariyê nedihêşt ew tutiştî bibîne. Hêdî-hêdî tarî dikşe û rûdêmê zemînê açiq dibe; Beyabaneke rût û pan, ne Kaniya Sipî heye û ne jî çavên wî bi tuçem û pêriyan dikevin, hertişt ji nav tiliyên wî herikîbûn û ji bilî ewa ku nav nigên xwe bi pelekî tiwiyê veşartibû tukesî bi xwe re nabîne.

Bi dîtina wê re çavên wî berjêr dirijên; “Ka belkî em nîşana buhuşta windabûyî, di nav nigên wê de bibînin”. Bi 56

windabûna pelê darê re çavên wî li deriyê jiyanê dikevin û dikevin buhuşteke nuh.

- “Ev cara dawiyêye ez dibêjime te ku, divê tu nirînên xwe li min bar nekî; Buhuşta ku tu dibêjiyê ew eynî deriyê dojehêye û tu yê nuha bi bînî”. Bi gotina wî re ew derî vedibe û kaniya jiyanê diherike, bi hezaran leşker dikşên û dikşên, di piş her timbekî, girekî de bi sedan kom dibin û riyên hevdu girê didin.

Bi dilopên baranê re çavan vedike ku li pêşiya deriyê kepînê ketî û goleke xwîn û mîzê di bin xwe de dibîne, bi çarlepan xwe dighîne ser nivîna sar û rût, nigên xwe têve dide hundir zikê xwe, êşeke zirav di hinava wî de derdibe. Dengê qêrîn û nalînan ber bi ezmanên tisî ve hildikşin û êşa beyabana tazî giran dibe, golên xwîn û xwêdanê pir dibin, laşên fetisî bihna ewan golan vedişêre û bi hezaran hêvî û omîd têne vemirandin, beyabana kuştin û windakirinê herdiçe fireh dibe û zemînê li seriyê wî teng

dike.
- “Divê ez birevim, xwe veşêrim, heya ev ordî winda dibe”. Lê ordî li dû ordiyê dikşe, zincîra dûpişkaye, bi tang û topên xwe bi ser wî de dikşên û dema nasdike dê hîne bi hezaran bikşên û cihê lingekî dê nemîne ku riya revê ji xwe re biqelişîne, ew ji cihê xwe hildibe. Piştî ku çend gavan difroşe dengê banga wê dike, heya bi wê hîngê bîrnebiribû ku nîvê dengê xwe li şûna xwe ji bîrkiribû.
Bi rê ve û di piş kendalekî de, ew di hembêza ordiyekê wer dibin, bi hezaran şûr û rum ber bi sîngê wan ve diherikin. Çend leşker wan didin nav xwe û têve didin bin konê serokê ordiyan.
57
Birûskên daniştoka zêrîn a ku di nîvê kon de cih girtî, pir çav kor kiribûn û bi hezaran jî tilî bi misdanên wê pûç bûbûn, lê tevî wê yekê jî golên zingar û kefnikê êrîşên xwe ajotibûn ser, hêştibûn ku serokê ordiyan sazûmanekê çê bike da ku çareyekê ji wan êrîşên, li ser daniştoka wî, re bibînin û bi boneya ku ew di vê yekê de bi serneketin e, pir zanyarên bin kon seriyên xwe winda kiribûn.
Herdiçû golên zingar û kefnikê fireh dibûn û qoçên serokê ordiyan jî dirêjtir dibûn. Bijîşkên bin kon weke kuvarkan serî hildidan lê wan jî, zû-zû, serî winda dikir û ew qoçên pîroz bi şûn ve nedikşîn, ne kar û dermanên bijîşkan, ne berger û lavlava mizgeft û keniştan, ne jî mêtin a mêjiyê zarokan dikarîn wan biçelmisînin.
Bi derbasbûna bin kon re, ew hêza leşkerî, rum û şûrên xwe bi şûn ve dikşînin û herduwê bendkirî têve didin bin

nigên daniştoka zêrîn.
- Du rê li pêşiya te ne; Tu dermanekî ji qoçên min re bibîne û wan ji nuh ve di mêjiyê min de veşêrî dê tu yê tûrek zêrê xwe bistînî û seriyê xwe winda bikî, riya din jî tu negihe tudermanan û tu seriyê xwe winda bikî. Serokê ordiyan deng li berdestên xwe dike ku, destên wî di bazinan de bibir in.
- Ez benî, windakirina min ji wan re dê ziyanekê bighîne lêgerîna me ya li dermên.
- Dekên xwe ji hêçekî weke xwe re bihêl. Tiştê ji me re gereke zimanê te ye, bi hezaran dest hene ku gunên me misdin û ew li şana tiliya me sekinîne. Ew careke wilo bû ku we bi dekên xwe karîbû seriyê me bifiranda û ji berî ku tu pozê xwe bi wî agirê ku te xwestibû ji xwe re bike simbolek û me pê bişewtîne, bila tu zanibî ku, roja îro, ezê mejiyê te li ser bibjêrim. Ma tu ne bi me re yî ku mêjîyên
58
bijartî ji yên xav xweştirin, me wê hîngê ev yeka nizanî û da ku tu nebêjî wîn kesin mafxwarin, em sipasiya we dikin ji bo naskirin û bidestxistina vê alava pîroz, hema tiştê biçûk, we hêştiye ku rojên zivistana vê beyabanê germ bibin.
Ew dinêre ku bi hezaran agirxane di bin kon de avabûne û hevalên ku, di rojekê de, li ser çiyayekî dîlanek di dora agirê xwe re gerandibû, ew îro agirên di bin kon de diparêzin.
- Zimanê wî jêkin. Piştî ku ew nagihe dermanekî da ku wan qoçên pîroz pê birewisîne. Serokê ordiyan fermana

jêkirina zimanê wî derdixe lê ji berî ku berdest bighênê û zimanê wî jêkin ew dêst hildide û ji wan dixweze ku hinekî rawestin; “Pirseke min e dawiyê ji te heye; Te ji me re negot eva bi te re kiye, tu weke bilî xwe nebêjî: xûşka min e, lê heya ku pîreka te be jî dê bê toxim nemîne. Ewê ku kare çar hezaran av de dê yeke din barê wî giran neke, gur bi pariyekî din namire”. Bi danîna dêst re êrîşa berdestan fireh dibe.

- Ez benî. Te dest û lingên min jêkirin û hêşt agirperestên bin kon wan li ser agirên xwe yên pîroz bibjêrin û bi min bidin xwarin, te çinîk-çinîk goşt ji min kir û di donê min de qeland bêyî ku ez bergera berdana xwe bixwezim, lê ez di vê kêlîkê de berger û lav an ji we dikim ku wîn zimanê min ji min re bihêlin. Bi gotinên wî re cobarên hêsrên serokê ordiyan derdibin û masiyên mirî bi çem re dimeşin.

- Em dikarin zanibin tu çima lava nejêkirina zimên ji me dikî.

- Tirsa min ne ji jêkirin û windakirina wî pariyê goşte, lê ezê bi wê hesret û dilmayînê herim ku min nikarîbû di

59

rojên xwe yên dawî de silav û nimêjên xwe ji we re hildana. Gotina dawiyê bi coka ku ji devê wî derdibê re diherike.

Kanî pir dibin, koma zimanên jêkirî bilind dibe û bi hezaran cok û rûbar bi hev dikevin û dikevin da ku leşkerên serok tê de bên şûştin.

Cindirês 3-2-2000

60
Vexwestin
Çavan digerîne, bi kûraniya wê de dinire, destê rastê dike refik û dide pêşiya tîrên rokê, carina jî çilpikê xwêdanê vedimrîne û bayê diherike dihêle gewriya ziwa biqijile. Çend caran kir ku, yek çilpikên xwêdanê daqurtîne, lê ji nîvê gewriyê de şorbûneke hêç vedigerî ser zimên, “Mirov bi vexwerina ava şor ziwa dibe”. Dema ev movik, ji berî demekê di pirtûkekê de xwendibû, -nema navê wê tê bîrê- bi lez di sere derbaz nebûbû.
Çend gav bi pêşe- şunde avêtin, dest hejandin; belkî bi fermaneke Xweda bifire û li gundekî, ser kaniyekê, bin konekî Ereban peya bibe, “Mixabin, bi baskin şikestî tuyê çawa bifirî”. Çend gavin din avêtin, ji dûr ve dîmena goleke avê dibîne, “Ew leylan e”. Tevî wê yekê jî dibeze, dixweze bawerke ku ne leylane. Her ku, ew bere pêş de dibeze, gola avê ji pêş wî direve.
Bihn çikyayî di ser hev werdibe, bi şewat digrî, ji hêsrên xwe şerm nake, ev cara pêşiye ku ji wan şerm nake, yekê dadiqurtîne, “Şore, çiqwas xwê di laşê mirov de heye”. Bi giriyê xwe re lingan vediçerpîne, korteke nuh di
61
wê beyabanê de dikole; “Xwedê carekê li ser lingên zarê Berhîm, di vê beyabanê de av herikand, kara cara bike dudu”. Bi ramana ku, jê bi dûrdiket kenî.
Gava Berhîm ê zaredeşt ji xew şiyar dibe, çarkoşe li ser nivînê rûdinê û kûr bi xewna xwe dirame. Piştî çend hejandinê serî û “Xwedê xêra vê xewnê bide”, hest dibe

ku qirika wî ji êvar de ziwaye û ew osnedibû ku, rabe avê vexwe. Bi dawîkirina piyala avê re sîngê wî fireh dibe û dema çavên wî li rehên pîrekê dikevin, ji nuh ve vedigere nav nivîna germ. Dengê derî dihêle careke din, bi zor, ji nav nivînan derkeve. Bi dengekî tûj pirsî.
- Kiye ?
- Ezim. Mirovekî bi zimanê erebî bersiv da û dema Berhîm ê zaredeşt derî vedike, cendirmeyekî digel çendekên din ku, di cîbê de rûniştine li pêş xwe dibîne.
- Keremkin.. em rûnin. Dîtina cîbê, hêşt kabokên wî sist bibin û heya bi demekê bê deng mabû, ramanan ew dabû nav xwe.
- Mala te ava. Ewê ku li derî dayî gotê û jê xwest ku, here cem çêwîş. Bi derketina ji derî, kurtik bi ber mitekî dikeve û diqete, nîvtazî li ber pencera çêwîş disekine.
- Navê te. Bêyî ku, çawîş serî ji pelên di nav destên xwe de hilde, pirsî.
- Berhîm.. Berhîm ê zaredeşt, ez benî. Bi gotinê re, nasnama xwe derxist û da dest çêwîş. Wî çend caran ew di destê xwe de qulabt, bala xwe da wêneyê reşik û ji nuh ve li Berhîm vegerand.
- De wer îmzeke. Çêwîş got û cihê îmezekirinê nîşanî wî kir.
62
- Dê keremkin em qehweyekê vexun. Piştî Berhîm îmzekir, mazovaniya xwe dubare kir.
- Em bi lezin. Pereyên qehwê bide şofêr, emê li çayxanê vexun. Em naxwezin we biwestînin. Bi birina

peran re, çêwîş ew pel da dest Berhîm û deng bi cîbê ket, taveke toz û pirsan li şûna xwe hêşt.
- Ev çi nameye û ji kê de. Di wê hîngê de, Zaredeşt bîr bir ku, ji wan ne pirsîbû. Bi lez, quncikê nama di dest xwe de qetand.
“Bi rêz Berhîm Zaredeşt…
Divê tu siba, li kata nehan sibeyê, bê cem me..
Hêza asayî”..
Bi naskirina jêdera namê re, damarên wî ziwabûn û dev miçiqî, kir û nekir ku bê lerizandin çend gavên mane bavêje lê bizava wî nediçû serî, piştî riswabûneke tûj ew gihîşte hundir.
- Te xêre.. kîbûn ew.. Xwedê me biparêze, tu çima deynakî. Dema çavên pîrekê bi riwê wiyî beravêtî dikeve, bi pêlên pirsan dor pêç dike.
Ew bê hest û guhdana pirsên pîrekê, xwe di quncikekî odê de, kom serhev dike. Rûpelên jiyana xwe, yeko, yeko, diqulbîne; Ev bû çend salên wîne dûrî serêşiya partiyan û konevaniyê çûye, erê di xortaniya xwe de, çend salan bi wan re mabû, lê tikarên xerap li hemberî dewletê, ji wî derneketibûn û ji roja ku, hevalan jê xwestibû berîd bighîne Cezîrê û virde, wî sûnd xwariye ku, ewê ranehêje tiştên dijî dewletê û ev bû çend salên wîne, gotina “Destê ku te nikarî gezkira, maçke û deyne ser eniya xwe”, ji xwe re kirî nîşan, “Ev çi dixwezin û çima piştî van salên
63
dûdirêj. Di wê rojê de.. giş ji wir de dikişe, bes eger ku wî dîtiba ma ê dest di min de negirta, erê çend caran wî li

çente dinirî û bervê xwe bere min dikir, bes ku guman biribe ê dest di min de bigirta.
Min gote wan, ez ne ê van kara me lê ji ser hişkiya xwe daneketin, ma divyabû berîdê Cezîrê bi destê min biçe.. Çima ez pîreka xwe naşînim, bila ew ji min re bipirse; ev çi dixwezin û belkî ew karibe, bi rêka xwe, min ji ber bihna van derîne.. na, na ev bê namûsiye". Ew bi xwe û ramanên xwe ve ketibû, haje dor xwe tuneye, bi dehê caran pîrekê deng li wî kiribû lê deng ji dîwarê odê vedigerî û pir caran jî zaro, di lîskên xwe de, bi serde diqulibûn.
- Çi bi te hatî, Bi hejandina û dengê pîrekê re vegerî ser hişê xwe.
- Tu çi dixwezî, ez malê ji te re bêlim. Gotina dawî di derî de got. Toz û bayê germ ew pêçand, xwe da sîka dîwêr, tîna rokê hêştî ku, kesên bajarokê Cindirêsê birevin quncikên tarî, ji bilî çend mirîşk û bizinên dev ji hevkirî li cadê nedîtin. "Ezê bi ku ve herim û hawara xwe di kê kim". Tûrekî lestîkî, bi firîna bê re, li sîngê wî dikeve û berî ew bi rêkeve, çendek kirin bala xwe ku, bi ser wan de here û çêroka xwe bêje wan; belkî dilê yekî bi ser de bi êşe.
Ew kete nav ewrên toz ê û zibil de, bê silav di pêşiya çend cîranên xwe re borî. "Ez diyariyekê di destê xwekim û… na hîne zûye, ezê a nuha herim qehweyekê li cem Memo yê Keleş vexum û piştî ku, derdê xwe jê re aşkerekim, emê wê hîngê binerin çibikin".
Dengê zemra tirektorê û qêrîna ajovan, wî ji xwenerojan

şiyar dikin, bi ustû xwarî dide ser riya xwe. Dudiliya
64
xwe dibire û li derî dide, piştî kurte demekê, deng bi pîrekekê dikeve.
- Kiye. Ji kûraniya avahiyê ve deng hat.
- Ezim.
- Tu kiyî. Bi zirtî pirsî, hêşt ku Berhîm heya bi demekê bê bersiv bimîne.
- Ezim.. ez Berhîm im.. Berhîmê Zaredeşt.
- Tu çi dixwezî. Bi gotinê re derî vekir. Pîrekek pêncî saliye, mikyac bîst salan ji temenê wê duxe û dihêle sî salî xûya bike. Di ber bêcemê xewê deye, pişkokên sîng ên jorin vekirî hêştine. Bi dev- kenî gote Berhîm, “Keremke, te çi dixwest”.
- Karekî min bi Memo heye. Ew li male. Di nav gotinan re carekê çav hildan riwê pîreka Memo ku, ewê bi harî li wî dinêre.
- Eger ew ne li malbe, ma qey mala wî jî ne li male, keremke. Dawiya gotina xwe jî bi kenekî kûnde tewakir.
- We sipas dikim û mala we ava, ezê careke din vegerim. Wî bawer nekir çawa ji nav lepên wê bireve û ne bawere ku, gotina dawiyê bihîstibe, lê kenê wêyî kûnde bilindtir bûbû.
Ew di cem çendekên ku, deriyên hukumet nasdikin re borî, tevan Memo yê Keleş nîşanî wî dan, nemaze piştî dizanîn ku, mesela wî li cem hêza asayiye û bi boneya ku, wî li mal bigre, ew çend caran hat ber deriyê wî lê hertim dengê pîrekê digel kenê wêyê kûnde, ji piş derî dihat û

digote Berhîm ku, “Ew hîne venegeriye û belkî îro venegere jî”. Tevî vê yekê jî, ew çend carên din hate ber derî û lê pirsî.

65

Wê şevê xew neket çavên B. Zaredeşt, bi dehê caran ji nav nivînan derket û bê guneh şerê xwe dajot ser pîreka xwe. Bi bangdana mele re ji mal bi derket, kir ku here û careke din li deriyê M. Keleş bide lê kenê kûnde, ew bi şunde vedigerand.

- Xwedê xêra te bide. Kale- mêrekî gotê. Ev bû panzde salin wan mala xwe anîne û li bajarê tozê bicih bûne, di van salan de kesî ew li ber deriyê mizgeftê nedîtiye û hatina îro hêşt ku, yê pêşî li xêr hatina wî bi pirse. Evê pirsê çêroka Eliyê Egêl anî bîrê ku, wî di bin pirs û xwestekên gundiyên xwe de, rojekê dev da mizgeftê lê ji bextreşiya demê, ew di wê rojê de nîvserxoşbû û dema bihna mey bi hundir mizgeftê ket, mele jê re got.

- Kafir, tu û van deran, tu li çi digerî. Hêşt ku, Elî di cî de bizîvire û berî ji derî derkeve, ji mele re bêje.

- Sipas, berket vêrsin ku ji wede bû û ne ji min. Ji wê rojê û bi şûnde, kesî newêrêbû jê re bigota; “Çima tu naçî mizgeftê”.

Wî hinekî li nimêjkeran meyzekir û hêdî- hêdî ber ve avrêjan çû, karê xwe qedand, dest û riwê xwe şûştin, tevilî civata nimêjkeran bû, weke wan rabû û rûnişt. Ji mizgeftê derket û kete ser cadeyên bajarokê Cindirêsê, ji yekê derdikeve û dide ser ya nuh. Cara pêşiyê ku, xwe bê pişt û bi tenê dibîne, ne dost û hogir, ne jî asoyekî vekirî.

Bi otobîs ê pêşî re, dev da bajarê Efrîn ê. Wî karî bê pirs jî avahiya hêza asayî naskiriba, lê xwest çend kesan bisekinîne û hinekî zimanê xwe nerim bike lê dema dît ku, ewên bi rêva disekinandin bi nirînen pîs li wî dinêrin, ustû xûzkir û berve wê avahiya tal ve çû. Bi destekî lerzok, pelê ku di dest de şilbûye da dest dergevan. Bi dîtina navê serokê xwe re, ew rê ji B.Zaredeşt re vedike û cihê wî

66

nîşan dide. Ew xistin odeyekê û jê xwestin li wir bimîne, heya ew tên û wî dibin. Berhîm ê Zaredeşt mîna mêxekî kefnikî, di nîvê odê de venîştî dimîne. “Bihna laşê mirovan ji vir tê, bi Xwedê kabokên min şikestine, ez bawerim ji gera vê sibêye û nemaze şeva çûye min xewnekirî. Ewê çi bi pirsin û li kê, bes çima ez û piştî van salên dû dirêj, nema navên wan têne bîra min û eger ez bêjim wan ku, min navê wan ji bîr kirî dê ji min bawer nekin, belê.. Çima ez navina li cem xwe çênakim û nabêjime wan, bes ku didû wan navan kevin û derewîna min nasbikin dê berdan ji min re nemîne”.

Di dema ku, wî mejiyê xwe dikola da ku karibe navên hevalên berê derîne û xasma yê pirsiyarê wan, derî vedibe û yek derbasî odê dibe.

- Keremke, serok te dixweze. Dengê wî hêşt zincîra ramanan hilweşe û berî bide dû wî, cilên xwe dûz dike.

- Siba we bi xêr be, ezbenî. B. Zaredeşt ne zanî gotin ji devê wî derket an jî ji yê pêre.

- Tu bi navê B. Zaredeştî?. Bêyî ku, ew seriyê xwe ji nav pelan derîne, pirsî.

- Belê ezbenî, Bi zimanekî lerzok, bersiva wî da.
- Te di sala heyştê û çaran de leşkerî di dadgeha parastina dewletê de dikir?
- Belê ez benî. “Çi demin xewşbûn, kesî newêrîbû li çavên min binêre, min jê re digot te xêre, di wan rojan de, Xwedê çi hêz dabû min”. Pirsa serok xwene- rojên wî revandin.
- Bigire! Tu karî herî. Dema dît ku, bihna wî hîne di hundir deye, çav ji pelên di pêş xew de rakirin û li riwê
67
mirovê di ber masê de sekiniye nirî, riwê beravêtî û zelalbûna çavên Berhîm tirsek xiste dilê serokê hêza asayî, hêşt bi dilovanî jê re bêje.
- Te wê hîngê bîst û pênc dirav bolse danîbûn û nuha ji te re rêkirine. Bi naskirina sedema anîna wî re, kenekî sar û fireh jê kişiya, guh û mejiyê serokê hêza asayî werimand, hêşt ku ew çavekî di berdestê xweke da ku, wî ji hundir derînin.
Tev kenê wî ew derxistin cadê. Berhîm ê Zaredeşt dikir û nedikir ku, ewî kenê riswa bisekinîne lê her ku, bizavên xwe di vî alî de dikirin kenê wî bilindtir dibû û dihêşt xeleka mirovên dora wî firehtir bibe.
Cindirês - 1999
68
HÊVÎ
“Ji Stêr ê re”
Qîj-qîja wan ber bi ezman ve diçe, kes dengê ya din nabîse; berger û hêvî, xeber û lavlav, ken û girî tevlîhev

bûne. Di nav wan de dengê giriyê mendalekî û wêje-wîja wî bilindtir dibe. Du-sê pîrek, bi hev re, lîlandineke tûj dikin. Hîne bêdengiya wan di odê de ziwa nebûbû, deng bi mendalekî din jî dikeve û careke din dengê lîlandina difore.

Komeke jin ên rengo-reng li wê derê civiyane; cihê lingekî nemaye. Her yek dixwaze dengê xwe ji ya din bilindtir bike; belkî bala Pîrikê bi ser xwe de bikşîne. Ewa li ser têxt dirêjkirî navkutka dide xwe, hawar-hawara wêye, lê hersiyên ku li erdê dirêjkirî jî bêdeng nesekinîne. Pîrek jî, mîna pinpinîka, ji yekê diçe ya din, lê bala xwe bêtir li ya ku, li ser têxt dirêjkiriye. Hemû nîşan û simbolên zayînê ji laşê wê dadirivin û çilpikên xwêdanê, di eniya wê de, dipişkivin.

Gumana Pîrikê li erdê neket, Meyra Xemê cara paşin qîriya û pêre jî deng bi zarokê wê ket, her yek bi aliyekî

69

têxt de qulibîn û mîna ku di xewneke şêrîn de be, dengekî got:

- Pîroz be, lawike. Pîrikê got û bi lez navika zarok girêda, ew hîne ji paqijkirina Meyrê xelas nebûbû, deng bi jinekê, ji hersiyên ku li erdê dirêjkirî, dikeve. Bi lez dibeze ser nivîna wê û bi mamosteyî dihêle ew jî barê xwe deyne. Pîreka nuh bar daniye, bi tirs û lavlav serî hildide û li nav lingên zaro dinêre, pêre-pêre hêsirek ji çavan diweşe û berkeniya wê vedimre, serî bi ser balîv de dikeve û êşeke tûj, di hinava Xeca Bilo de, derdibe.

Di du kat û nîvan de, pênc zaro dêng li hev dikin.

Berdestên Pîrikê, di oda paqijkirina zarokan de, bi karê xwe yê rojane radibin, her pênc zarokan dixînin nav qundaqan û di nik hev de wîje-wîja wan e.
Xeca Bilo ji berî gişkan dikeve odê û radihêje qundaqa ku, Pîrik dide dest û bi lez ji odê dertê. Dema mêr, ken û pozbilindiya wê dibîne, di cî de şeşara xwe dikşîne û deraqekî di rûyê ezmên de vala dike.
Pîrekên din jî, her yek radihêje zaroka xwe û bi çavşikestî ji odê dertên; Meyra Xemê digel xasû û mêrê xwe ve dikevin ser riya mal.
Mêrê Xeca Bilo, şan û şoret li darxistin, kes di gundê Kêşikê de nehêşt ku, sê caran dawetî teklifa xwe nekir; "Xwedê, piştî heft keçikan bi riwê min ve nerî û ev lawik da min". Ew bi xwe li malên gund digerî û digote wan ku, "Îro xew tuneye, divê def û dîlan, heya bi heft rojan, sar nebe". Ew ji hêman û surûşta xwe derketibû.
Komek jin li dora Meyra Xemê rûniştine, dengê yekê naçe ya din, di nav de carna giriyê zaro bilind dibe û dengên wan vedimre, lê dema gihîşt radeya ku giriyê wê
70
bihna wan teng bike, xasiya Meyrê radibe ser xwe û di nik cihê bûka xwe de, qundaqê vedike. Meyrê jî serî ji ser balîvan hildide û dema ku, çavên wê bi nav lingên keçikê dikeve, hiskîniyeke tûj ji wê tê.
- Na… na, ev ne zaroya mine. Bi gotinên wêre deng ji civata pîrekan tê birîn. Pirê wan destan davêjin "rihên xwe" û bi çavine beloq li wê dinirin. "Wê ji min re gotibû; pîroz be lawike". Xasû şêt û mêt dimîne, ew ne dizanin ku

Meyrê ketî bin saweke giran an jî jê bawer bikin.
Ev gotin di nava gundê Cindo de belav dibe, rûniştinên ber mizgeft û ser bênderan pê têne borandin. Guman di hundirê wan de, her roj firehtir dibe û di sibeyeke sar de, mêrê Meyrê dikeve ser rêya Efrîn ê, dêv dide cem Pîrika zara xwe, da ku guman û rastiyê ji hevdu bibire.
Sê roj di ser bûndina zaroyan re derbas bûbû û hîne ji bilî ava şêrîn û hineke razyane neketiye devê keçika nuhatî, heya piştî bergera pîrekên gundê Cindo jî ku, Meyr ê pêsîrê xwe vekir û xwest memikên xwe têxe devê keçika biçûk dît ku, ne şîr di wan geriye û ne jî keçik memikên wê digre û ew ji vê sibeyê de li benda mêrê xweye ku, salixa rasteqîn ji wê re bîne; ew li benda bersiva ku, “Bi şaşbûn lawikê te bi keçike pîrekekê, ji we pêncên ku we bi hev re barê xwe danîbûn, gewrîne”, mabû.
Di deriyê Pîrikê de, herdu silavê li hevdu dikin û her yek dikeve wê gumanê ku, ewê din cara dîtiye lê rewşa wan nedihêşt ku, li ber vê yekê bisekinin; mêrê Xecê piştî hinek pirs û şîretan da ku, çawa û kîjan şîrên qutiyan bidin lawikê birçî, bi lez derketibû û wî dixwest dêv bi dermanxanê de, lewra hindik mabû ku, li ew kesê ketibû derî de û hêştibû wêneyên dostên xweyî dûr û nêzîk bi
71
bîrbîne, bikeve. Lê gava nêzîkî li dermanxanê kir, mêrik û silava wî ji bîr dike.
Dema pîrikê seriyê wî dît, di cî de rû avêt û bi zimanekî tûj deng li berdestên xwe kir ku bi lez oda zarokan bimalêşin. Wê hêşt ku mêvanê xwîngiran di nîvê odê de,

heya bi demekê, bête tevizandin û lal bimîne.
- Bê qusûr, biborîn.. ez nizanim çi bêjim… berî her tiştî, te ez naskirim. Piştî berxwedanek ne hindik, mêrê Meyrê pevokên xwe dan dû hev. Dema Pîrikê aliyê wî yê din naskir, ji nuh ve dilêriya xwe kom ser hevkir û bi mirûzekî bê hest lê nirî û got: “Na, bes ne dûre ku, tu carekê bi jina xwe re hatibe cem min. Rojê evqas kes di cem min re derbas dibin, keremke tu çi dixwazî”.
Mêrik demeke dirêj bê deng dimîne, pêlek wî dibe û yek tîne, çawa jê re bêje ku, pîreka wî dibêje, lawikê wê bi keçikekê hatî guhartin. “Ne dûre ew bêje min tu merîkî dînî û divê bi ser de jî polîsan ji min re bîne”.
- Keçika me birçiye û memikên dê nagre.. ev bû sê roj ji bilî ava şêrîn tutişt neketî zikê wê”. Sawa ku di çavên Pîrikê de derbûbû vedimre…
- Xwe netirsînin, ev tiştekî normale. Zarê nuhatî ku heya bi çar-pênc rojan jî tiştî nexwe nexeme. Bes bila pîreka te bizavên xwe bike û dema zaro motacî xwarinê bibe, wê ji ber xwe memkan bigre.. Ma ew ya weyî pêşî ye”. Mêrik, seriyê xwe bi angoya “belê” hejand û piştî hinek şîret jê girtin rabû ser xwe da ku derkeve. Berî ew ji derî derbas bibe, dengê Pîrikê ket guhên wî. “Eger ku, keça te piştî du rojên din pêsîrên dê negirtin, divê hûn şîrê qutiyan bidinê û pelê ku, li ser navê şîr nivîsandibû da dest wî”. Pîrikê dixwest ku di dema axaftina xwe de, tinaziyên xwe bide şûn lê bizavên wê bi ser nediketin û heya dema
72
ku mêrik di qurzîka çavekî de hinek hêrs rijand jî, wê

nikarî berkeniya tiraziya xwe jê veşarta.
Bi rêve, danûstandineke bê dilovan ew bendkiribû; ramanekê dilê wî sar dikir û yekê jî pêlên guman û nedilbicibûna wî germtir dikir.nemaze berkeniya wêyî tinazî ku dihate bîra wî dihêşt gumanên wî tûjtir bibin.
“Bes.. na wilo nabe.. çawa nizane.. wê bi devê xwe du-sê caran, ji min re, got keçika te, bêyî ku ez matbûnekê di çavên wê de bibînim”. Hîne evê bersiv û encamê cihê xwe di dilê wî de negirtî, ramanên reş bi ser wî de dibarîn; “çawa ewê zanibe ku zêdebûna min law an keçike û wê ez nasnekirim. Ma ne piştî min got; keça min birçiye, wê jî got keçika te.. Bes bûyer ne ji mêje û wê jî got ku, rojeke tekaneye di jîna wê de û bawer nake ku, careke din ewqas Pîrekên bi ducana li cem wê bighên hev”. Bi vê baweriyê hinekî dilê xwe rihet dike û dikeve ser riya gund.
Sê-çar rojên din di ser pênc mendalên nuhatî re derbas dibin. Ev herdu zar, her roj bêtir dihelin. Bavên wan li deriyê bijîşkan vedipekin, mêrê Xecê dikir ku, xwe buxwe û bi ser bijîşkan de dikir qîre-qîr “çawa tunexweşiyên wî tunene, eger wiloye.. çima şîr venaxwe”. Di sê rojên pêşîn de, wan hinek ava şêrîn û razyane vedixwer, lê piştî wan sê rojan, nema evan tiştan jî vedixwen.
Gundê Cindo û Kêşikê nêzîkî hevin, mirîşkên wan tevlî hev dibin, pir jin bi hevdu berdêlkirine, lê pir xwîn jî di navbera wan de rijiye û ewan mirîşkan fêm nedikir; dîsan jî diketin ekûr û ser sînorê gundê din, dê bihştana şerekî nuh bi hevdukeve, xwîn bêtir bête rijandin û keçikên nuh gihayî bibin qelen da ku, karibin kuştiyên xwe di yek

mezel de veşêrin.
73
Piştî bîst û yek rojan, ji girî û lavlav.. ji bijîşk û dermanan, lawik cara dawî deng ji xwe derdixîne û dikeve xewke bê şiyarî. Qêrîn bi Xeca Bilo dikeve û mêrê wê weke koviyekî birîndar êrîşî ser candekê lêwik dike û di ore, azireke hovî dilê wî dikole, kesên ku li dora wî civyabûn çiqwas dixwestin wî ji ser cendekê lawikê mirî rakin, lê bê çare jê vedikşîn û demeke dirêj di wê kefleftê de man da ku karibûn lêwik ji hembêza wî derînin.
Di rê de û piştî ku, lawik veşartin Xeca Bilo ketibû nav komeke jin û bi şênî berve gund dihatin, carina deng bi met an jî xaltiyek lêwik diket û xelkê negiriya azirî ya Xecê bi angoya birîneke kûr fêmdikir û digotin; “Rebenê, piştî heft keçikan û sondxwarina mêrê wê ger ku, zikê dawî jî keçik be dive ji cem Pîrikê bide ser riya mala bavê xwe; dê ew li xwe heram kiriba… Piştî van heft keçikan bi lawikê xwe şanebû, Xwedê dilê kesî neşkîne”. Xecê jî ketibû nav mij û dûman de, dê çawa ji mêrê xwe re, windabûna sê cotên bazinan, bin cil bike.
Gava gotin û wêneya mêr hat bala wê, çavên xwe li wî gerandin, lê bê pêjin bû. Ji gava ku ew gihîştibûn nêzîkî goristanê kesî ew nedîtiye, çend caran li dor wan daran û bi çend dengan lê gerîyabûn da ku, seriyê wî xweşbikin, lê bê sûde bûn û nuha, Xecê jî çavan digerîne lê mêrê wê “bûbû pariyek nan”.
Ew hîne di nîvê rê de bûn dîtin ku, ji wê ve komeke jin û mêr rahiştine candekekî bi çûk û bi şêniyeke hêmen ber

bi mezel ve tên. Gava ew nêzîk dibin û çavên Xecê bi
Meyra Xemê dikevin û dinase ku, ya mirî keça wê ye,
qijînî bi dil û zimanê wê dikeve û bi êrîşiyeke kovî xwe
dajo ser cendekê keçikê, berî ew bighe wê çend pîrek wê
74
digrin û guhnadin lavlavên wê ku, bihêlin ew nerîna dawî
li keça xwe bike.
- “Stûyê min bişke, mala min wêran bikeve.
Ew ji ser hişê xwe çûye, her miriyekî dibîne bi
wêye ku, lawikê wêyî miriye”. Pîrejinek dilorîne û
Xecê ber bi gundê reş ve dikşîne.
Cindirês 1999
75
Qesra Mîr
Rojekê ji rojan, gotina pîrekên bajêr têne ser hev; Ev jî
di dîroka bajêr de cara pêşî bû ku gotina du kesan bê ser
hev. Bi dengekî gird û mîna lehiyekê, ku ji devê Xwedayê
kaniyan birje, lehiya pîrekên bajêr di kolanan re diherike û
di dawiya dawî de, li ber deriyê Mîr radiwestin û dihêlin
ew ji hembêzên komjinên xwe derkeve ber pencereyekê:
“Ew çi dixwezin”, ji şêwirdarekî xwe dipirse û gava
têdighe ku xwesteka wan dîtina wî ye, carekê- dudiyan li
lehiya wan dinire û qesra xwe li wan dipîve; têdighe ku
qesra wî dê têra wan neke û ew evê yekê dike bala xwe, ku
gereke qesrê firehtir bike da ku, û eger ku, rojekê dilê wî
xwest û miletê xwe vexwîne cem xwe an jî wan di qesra
xwe de dîl û bendkirî bike, gereke ew qesir têra wan bike.
Evê sedemê hêşt ku ji şêwirdarê xwe re bibêje: “Bila,

tenê nûnerên wan derbasî cem me bibin”, û ew ji nuh ve vedigere hembêza daniştoka xwe û koma jinên xwe yên ku li dora daniştoka zêrîn civandibûn dişelîne û wan ber bi odeyên wan ve dişîne.

Piştî qirecireke dûdirêj; ka kî gereke derbasî cem Mîr bibe û kî derbas nebe, ka kî dikare nûneriya wan bike, û gava Mîr dibîne ew negihêştin tubiryaran, dêng li

76

dergevanên xwe dike ku ewên li ber derî berdin cem wî: “Hertim sergovand ê herî başe û dizane çawa dîlana xwe bigerîne”. Bi vekirina derî û têvedana yên piş re, çend pîrekên ku di devê derî de hatibûn civilandin, mîna bireka ku ji devê tivinga zer direve, di nîvê salonê de radiwestin. Wî hîne negotibû: “Xwedê xêra we bide”. Bi hev re deng bi wan dikeve û ji bilî çend gotinin ji hevketî, Mîr tutiştî din nabihîse û ne jî têdighe ka ew çi dixwezin, ew du-sê caran bizavên xwe dike ku xwestekên wan nasbike lê hercar bê sûde dertê. Bi hêrs destekî xwe hildide û dengê pîrekan dibire, tiliya xwe ber bi ya herî pîr dirêj dike û ji wê dixweze ku xwestekên xwe bîne zimên.

Heya bi demekê Mîr tênegihêşt, ka diya pîr henekan dike lê ew xewnekê dibîne; kesî hîne wilo nekiriye û ne jî ew biryar di destê wî de ye û Mîr dirame ka çi hêştî ku ev pîrek bighên evê biryarê û ka ewê çi bersivê bide wan û wan ji vê riyê vegerîne: “Xwedê kir ku min komjinên xwe ji vir derxistibûn û wan ev çêrok nebîstin”.

- Diya pîr ev yeka ne ya bibêye; Tu çawa ji min dixwezî ku ez fermanekê derînim û rê bidim we ku heryek

ji we karibe çend mêran ji xwe re bîne. Ezê bi evê yekê sîstema bajêr bînim xwar.. na.. na, dev ji van çêrokan berdin û vegerin mal û mejiyê xwe diseriyê xwe kin. Mîr daketibû nav koma jinan û mîna dîkekî di nav wan re digerî û wî çendek di ber çavên xwe re kirin da ku keriyê xwe mezintir bike.

Gava Mîr dît ku ew li seriyê xwe nîştine û ji ya xwe venagerin, wî gote wan: “Emê nuha bi hev re şanoyekê binimûnin û di pişt re emê binirin ka tayê reş bi kê re ye û kî xwediyê yê sipiye”. Mîr dêng li çend berdevkên xwe dike û ji wan dixweze ku ew beroşekê ji wî re bînin û di

77

nîvê salonê de deynin û piştî ku her pîrekek radihêje kûpekî avê, Mîr ji wan dixweze ku heryek ava xwe valayî beroşê bike, bi valakirina ya dawiyê re û vegerîna wê nav hevalên xwe, Mîr careke din dêng li wan dike ku ew rahêjin kûpên xwe û ber bi beroşê bên: “Emê nuha bihêlin ku hûn ji nuh ve kûpên xwe dagirin lê tenê merceke me heye û ya ku tê de bi ser keve emê netenê bihêlin ku ew kûpê xwe dagrê lê emê rê bidine wê ku ew, ji xwe re, çend mêran tîne bila bîne û ji peyayên me, hûn razîne”.

Tevan bi erênî seriyê xwe hejandin û ji Mîr xwestin ku ew merca xwe bibêje: “Emê a nuha bibêjin, lê ya ku nîne cih emê wê jî tevî keriyên jinên xwe kin û weke ku me berê jî gotiye; Gur bi pariyekî din namra. Binerin tenê merceke û emê bihêlin wîn a xwe bi ser ya me xin, de herkes rahêjin kûpê xwe û bi ava ku têdebû dagrin”.

Çendekên ku bezîbûn û ji berî ku bighên beroşê ew jî mîna

hevalên paşmayî, û bi têgihêştina hevokê re, di cihê xwe de rewisîn. Mîr di bin simbêlan re dikene û ji berdevkên xwe dixweze ku cihekî ji koma jinên wî yên nuh re bibînin û ew, xewn û xewnên xweş, bi ber dilê xwe direşîne.
Dê îşev û ji bilî çendekî xew nekeve çavên wî; Piştî ku ew li ser çendekan, ji pîrekên xwe yên nuh, gerî û bi dengê mele re vedigere odeya xwe ya razane, ew tê de derdixe ku hêz û xewa xwe di wê gera xwe de windakirin, û tevî ku wî tukesî din bernedida ewê odê da ku ji bilî bihna wî nekeve wir û bêvilên xwe bi bihna kesekî din negemirîne, dîsan jî xew nebû mêvana wî.
Şeveke kinbû di deriyê xwe da lê dûvê wê pir dirêjkir, nemaze piştî ku xew revîbû û hêştibû ku ew mîna dînan ji odeyekê derkeve û têkeve ya din bê ku ji bilî serseriya xwe, tutiştî din, di wan deveran de bibîne û piştî ku pişt li
78
wî dişke û bi tîrên rokê yên keçîn re vedigere odeya xwe, dêng li mezinê cadûgerên qesrê dike û jê dixweze ku xewna wî ya şeva çûye raveke û ji berî ku ew ji Mîr bipirse ka çi xewnbû, Mîr dibêje: “Şeva çûyî û weke ku tu dizanî gereke me ya herşev li ser mal û milet hebû da ku em rê û rêçikan li ber çete û dizan asê bikin, em derengî şevê vegerîn odeya xwe û me hîna seriyê xwe dananîbû ser balîv û weke hercar em di xew ve çûbûn; Dilê me paqije û destên me jî sipîne, çima lûsa xewê dê di çavên me de nelezok be û çiyê bihêle ku em bi dû wê din lê mixabin şeva çûyî û piştî ewê kêlîka ku me tê de xewkiribû û ew xewn dîtibû me naskir ku reva xewê, ji

çavan, çiqas tûj û girane”.
Dema Mîr sîka bêaramiyê di çavên wî de dibîne û dike ku dêng li şûrlîzê xwe bike, cadûbaz mîna kitikan ku çawa di rojên zivistanê de xwe di yekî didin, ew jî û bi himhima xwe bi Mîr dide fêmkirin ku çêroka wî pir xweşe û ew dikare li ser lingekî çêrokên wî bibhîse, bêyî ku tevizîn tekeve wî lingî.
Mîr bi evê xwedinê re bêtir diwerime û mîna dîkekî sîngê xwe bêtir bilind dike û dibêje: “Min dît ku ezî li çoleke tîr dimeşim û ro, tenê, bi gazekê di ser seriyê min de sekiniye û hêştiye ez û ewê beyarê ziwa bibin, eger ku yekî bi me herduya bigirta û biguvêşta dê dilopeke av jî ji me negirta ne pir dûrî me jî beroş û beroş belav bûn û av ji wan dadirivî lê her ku min av ji wan vedixwar ez bêtir tihî dibûm û vêre jî dêwek ji binê wê ve serî hildida û digote min: “Ev av ne ya te bû, te çima jê vexwar, de ka ji nuh ve verîşe”.
Cindirês 2000
79
Çêr - Çêrok
80
81
Çirûskin ji Jiyana
Hesê Rût
Pêkenîn .
Dibêjin ku navê yekî derketibû ku ew, ji xwe re, bi her yekî dikene û wî tazî dike. Evê yekê hêşt ku Hesê Rût ji mala xwe derkeve û dêv bide gundê wî kesî. Zû- dereng,

ew dighe gund û wî di gedûka malekê de digre û jê dixweze dê çawa karibe bi wî jî bikene. Camêr li Hesê me vedigere û dibêjêyê; “De ka li vê derê li benda min bimîne heya ku ez karê xwe li vê malê diqedînim û ezê bêm û ji te re xûyabikim”.

Pir dereng dibe û ew kes venagere, dihêle bihna Hesê Rût teng bibe û xwe li hewşa wê malê bade, bi dengekî – dudiyan bang li xwediyê malê dike û, piştî ku ew dertê, pirsa wî kesî dike. Xwediyê malê destên xwe li hevdu dixe û, piştî ku du-sê caran jî ustû badide, dibêjêyê; “Ewî silavek da û li bersivê jî nesekinî û di gedûkê re derket, çû”. Hesê Rût dinire ku wî destê xwe bi aliyê din de dirêjkir û tê derdixe ku du gedûkên hewşa wî hene.

82

Evê têgihêştinê hêşt ku ew bi ser xwediyê malê de biqîre; “Law mal xerabo ma tu ji Xwedê zanetirî, heya ku tu du gedûkan ji hewşa xwe re çêdikî. Wî çima du dev ji te re çênekirin”. Piştî gotinên xwe, ew jî, di wê gedûkê re derdikeve û bi rêve dirame; çima ew ji pêş wî revî û, ji xwe re, bi wî jî nekenî.

Ew di van ramanên xwe de bû û dem jî derengî şevê bû, heyv jî ji zûde reviyabû û ezman rût hêştibû. Evê yekê dihêşt ku yek li nîvê yê din keve da ku zanibe hineke din, ji bilî wî jî, li ser rêçikên gund dimeşin. Pir naçe û Hesê me ji rêçikê derdikeve û di binê rê, di kortekê, werdibe û hîne jî ew, bi wî û reva wî, diramiya bêyî ku bighe tutiştî. Zîrekî .

Rojekê jî ew li civata Axayê gund rûniştibû û, weke

hercar, xizmetkariya civata wî dikir û yek şiv, cixare ji bêrîkên wan dikişandin, helbet çend pîneyên nên jî bi destketibûn û dêwên zikê xwe pê xulmaş kiribûn.
Nexêr, dilê mêvanekî Axê li vexwarina mey vebû. Dem zivistana qerte; heft şûrikên avê li derve bûne yek û borbora seg û guraye. Çend caran Axê got; “Kî diwêre rabe here Şiyê”. Lê deng bi tukesî neket; çûna ji gund heya bi Şiyê divyabû yek di ber mezelê Şêx re bibore û gundiyên nêzîkî mezel dizanin ku herşev şan û şoret di wî mezelî de têne kirin.
Ji nişkeve, Hesê Rût, xwe davêje gorepana mêran û dibêje Axayê xwe; “Ezê herim”. Axê nedixwest wî bişîne da ku civata wî rût û bê xizmekar nemîne, lê turiyên din li
83
ber wî tunebûn. Piştî çend peran dixe destê wî, rê didêyê ku ew rabe here.
Bi rê ve, bi fîte-fît, dimeşe û pir caran dengê xwe dibirî ka kes li dû wî dimeşe lê na, tevî evê tevdîra wî jî, nehêşt ku du zirtik nekevin pêşiya wî û xwe, di ber kêla gora Şêx de, veneşêrin û bi gihêştina cem gorê re, Hesê Rût, bicarekê hilma xwe dibire, lê gava ku gotina meleyê gund tê bîrê ku; “Ewê silavê li gora Şêx bike tukes newêre nêzîkî wî bibe”. Hesê me, bi dengekî şeliyayî, silavê li gorê dike.
Bi vegrandina herdu zirtikan û derketina wan a ji piş kêla gorê, kabokên Heso dişkên û bi eynî wî dengî dibêje wan; “Xwedê hebûn û hejmara we zêde bike Şêxên min. Min ev pere anîn da ku hûn karibin kefenên xwe nuh

bikin”. Herdu zirtik, tena kirês, derketibûn pêşiya wî.
Dilketin .
Rojeke din jî ew di binê gundekî re dibore, jêmayîbê
segekî jî dema ku seriyê wî dibîne êrîş ser dike û bi gewtegewt
bi dora wî dikeve da ku keysekê bibîne û lepeke goşt
ji wî daterişîne.
Dengê seg dihêle ku keçikek di xweşikbûna rokê de di
sibeyên zivistanan de ji dergehê hewşê derkeve û dêng li
seg bike da ku ji wî rêwiyî vegerîne. Dengê keçikê dihêle
dilê Hesê Rût, weke ku zerikeke kuzotên sor bi ser de
kiribin, biqijile û bêyî ku riya li pêş xwe bajo, ew vedigere
gund û dibêje du-sê ciwanmêran ku di temenê wî debûn;
“Min yeka xwe dîtî û dilê wê jî li min heye”.
84
Ew xwe didin hev û dikevin ser riya gundê ku yara
Heso lê. Bi rê ve û ji berî ku ew bighên gund, yek bîrewer
derdikeve û ji wî dipirse, ku ew ji wan re bibêje; kengî û
çawa dilê wan kete hevdu û çawa hevdu naskirin.
Dema Hesê Rût çêrokê ji wan re dibêje, ew di cihê xwe
de radiwestin û ewê ku pirs kiribû dibêje hevalên xwe;
“Eger ku em ji wî ne hêçtir bana, me xwe bi ber bayê wî
nedixist û emê neketana dû wî”. Bi van gotinan re, ew ji
nuh ve vedigerin gund, lê Hesê me riya xwe dajo; tutiştî
nedikarî ewî ji ser vê riya pîroz vegerîne.. ji bilî segê wê
malê û bêdengiya keçikê.
Lê Heso hêviyên xwe nebirîne û ew hîne li gundê
keçikê digere.
Jinanîn .

Temenê Hesê Rût gihîştibû çel salî û wî hîne jin nanîbû û demên ku gundiyên wî jê re digotin; “Kuro tu çima nazewicî”. Ew, pirê caran, ji pirsê direvî û dikir ku nebîstî lê gava ku bidîta yek jê nagere, bi rûyekî nerim digote wî; “Min çend diravên xwe ragirtine da ku tazî û bê kefen neçim hizûra Xwedayê xwe û bihêlim ku ew jî, ji ber min ve, fedî bike”.

Lê gundiyên wî jê negerîn û gotinê; “Eger ku tu mir emê te rakin, xema wê yekê nexe”. Bûr – mecbûr hêştin ku ew li yeka xwe bigere, ya rast bêyî ku bihêlin ew li wê bigere, wan yek nîşan kiribû; tevan çavên xwe berdabûn kermekeçekê û jê re tînin.

85

Lê wî tucaran xema mirinê nexaribû û ne jî bi wê yekê ramiyabû; Piştî ku şeş meh di ser zewca wî re diçin, pîreka wî dimre, û hema ku hefteka wê diqede, ew xwe li civata Axê digre û di nîvê wan de radiweste û dêng li wan dike.

- Min tutişt nizanî û ne jî min dixwest zanibim, we ez hînî evê yekê kirim û nuha jî ne pereyên kefen man û ne jî jinik ma. Piştî ku civat têr dikene, Axe dêng li Hesê Rût dike ku here çayekê ji wan re çêke.

Rûmetkirin .

Lehengê me, di kirin û fermanên Xwedê de, şerpeze mabû; wî li dora xwe dinerî ku hineke ne tutişt bûne xwedî nav û deng û seriyên berana, ji wan tenê re, dadikevin û yên weke wî jî, û piştî ku ên pêşî dev û rûyên xwe dişûştin, bin diranên xwe yên kurmî bi pariyên tisî tijî dikin û pir caran ew parî jî bi dev wan nediket.

Evê yekê hêşt ku ew, di rojekê de, biqîre û bibêje; “Erê ew camêr, hertim, bi cil û kincên paqij têne civatan, lê sedî-sed û eger ku yek wan rût bike, dê ji bilî zikê wan ê mezin, tucudabûnê di navbera min û wan de nebîne û ew jî rê nade wan ku hertim cihê bilind ê wan be”.
Hesê me, her çaxekê, ev pirs ji xwe dikirin, lê ew nedighêşt tuçareyan da ku ew jî bibe xwediyê nav û dengekî girs, ji bilî ku here û bi seriyê kaniyê de birî, gûke. Erê wî hêşt ku av li tevan biherime. Lê bûbû, yek, ji xwediyên bi nav û deng.. û ew jî dikeve dîrokê.
Cindirês 2000
86
Mîrka û Çêrokên Avê
(1)
Rojeke zivistanê ye, azman bi ewrên baranê avise, ew li ber xwe dide, mirov gûman dike ku ewê di navbera kêlîkê û ya din de hilweşe. Dem jî ser êvarêye û rok ji zû de reviyaye û xwe di piş çiyayê Gewir, di kortika xewê de û ji ber bê û sermê, veşarstî.
Di evê rewşê de pasa Mabeta, ku ji Helebê ve tê, dighe pêşiya dikana Hec Ibo û xelkê gundên wan derdoran jê peya dibin û heryek hildide gava da ku karibin ji berî baranê xwe bighînin malên xwe. Lê ewên ku malên wan li gundên dûrî Mabeta bûn, kiribûn balên xwe ku ewên evê şeva zivistanê li ber agirê pixwereya dostekî xwe biborînin û heya ku şev kaldibe ewê çîrokên dostaniya xwe bi bîr bînin.
Hesê Zelê û Hemoyê Egîd jî mîna hemû lênîştvanên

pasê peya dibin. Ewana ji Helb ve li rex hevdu rûniştibûn û dirêjî û gir-gira pasê bi çêrok û serpêhatiyên gundên wan derdoran derbaskirin û ji berî ku ew bighên Efrînê û dema ku Hesenê Zelê seriyê xwe di pencerê re der dixe û li

87

derve dinire dibeje hevalê daniştokê; “Xwedê zanê, lê ez dibêjim hîne em negihêştine gund dê baran ê lêke”.

Bi bihîstina evê yekê re Hemo dibêje xwe: “Bi Xwedê ev defreteke ku ez îşev li Mabeta li cem dostê xwe bimînim”. Gundê wî dûr bû û ji zû de jî dostê xwe nedîtibû.

Bi daketina wan re, yek çilpikên baranê di tîna eniya wan de ziwa dibin û dihêlin ku ew ji xewnerojên xwe şiyar bibin. Herdu camêr milên xwe didin hev û dimeşin lê hîne wan çend gav navêtibûn Hemo xêtir dixweze û dihêle Hesê Zelê bi destê wî bigre: “Tê herê kuderê de ka were emê bi hev re herin”. Hemo vediciniqe, wî çêroka gundê Mîrka û avê baş dizanî û ev jî sedemek bû ku ew bixweze li Mabeta bimîne lê ev yeka ku ji Hesê hatibû hêştibû ku ew li van çêrokan vegere ka rastiya wan heya bi kîjan pileyêye. Hes jî bi ser xwe de ponijî bû û dema dît ku Hemo dixweze li Mabeta bimîne û ewê bi tena xwe di wê şeva zivistanê de dakeve gund, dilê wî di devê wî de rawestiye û bi destê Hemo digre û bi zorê wî bi xwe re dadixe.

Di çateriya ku ji rê diqete û derdikeve Mîrka, Hesê Zelê dêv dide gund bêyî ku ji hevalê rê re bêje keremke, lê ev yeka tutiştî nîne ber dilê Hemo û ew jî dide dû wî. Dûrnêzîk,

ew dighên ber deriyê mala Hesê lê heya wê hîngê deziyekî ziwa di wan de namîne.
Dema ku Hes derî vedike û dibîne hevalê rê dixweze xwe ji berî wî li hundir badê, ew di cî de dêst dide pêşiya wî, rê lê dibire û jê dipirse: “Kuva, tu yê derbasî kuderê be, bi Xwedê eger ku tu bi van cilan derbas bibî dê ez û te yê li derve bimînin û pîrekê dûvê me herduya di ber me re ke”. Hevoka dawiyê di piş derî de dibêje û bi girtina derî li
88
piş xwe, di rûyê Hemo de, dihêle reqînî bi eniya wî keve û ji xewneroja xwe şiyar bibe ku xewa li Mîrka ji wî re nema. Pîs-pîs ji ber derî bi rê dikeve û dide ser riya dûr.
(2)
Dîno jî wê şevê riya mal dernaxe û li çend deriyan vedipeke lê herku ew dighêşt ber deriyekî û du-sê kulemist di derî de diçandin û dihêşt malxên malê ji hembêzên jinikên xwe bêne kişandin û bi dengekî-dudiyan bi pirsin; kiye ewê evê nîvşevê li ber deriyê wane û bi naskirina dengê wî re dihêştin ew pir poşman bi şûn de vegere û li deriyekî din bipirse.
Dîno heya bi heft nîvşevan li deriyên gundê Mîrka dibe mêvan bêyî ku kes di rûyê wî de veke û ewê hêsira ku di kovana çavê wî de qeşa girtî bibîne. Û ji bextreşiya wî ye ku ew li deriyê merivekî xwe rast netê.
Derengî şevê û piştî ku xew li pişta wî siwar dibe û lingên wî giran dibin, ew xwe di piş sancekê de dimelisîne û piştî ku seriyê xwe dixe bin kurkê ku bi heftê cihê qetiyayî û nikare rê li ber kurbayên çiyayê Gewir bigre,

ew weke mirîşkekê lûs dibe.
Tenê di mirinê de bextê wî sipî derket; Di berbanga sipê de, mele derdikeve û dema dixweze here piş ewê xanîka ku li şûna çêşmê bi kar tanîn, û li ber sanca wê ew bi ser tiştekî vedibe, bi qêrîna mele re çend cîwarên wî jî, ku amediya xwe û destavê dikirin, komdibin û laşê Dîno yê ku ling xistine zikê xwe û wilo hişkbûye radikin ser piyan.
89
(3)
Dînê mala tunebin xêra wê malê çiye û Şêxên gunda tunebin kêra wî gundî çiye. Weke dihat xûyan ev pirensîpeke kûrbû di mejî û mêjûyê gundê Mîrka de; Ew tucarî bê van herdu nifşên mirova nediman, hertim çend şêx û çend dînên wan jî hebûn.
Di van salên dawî de û tevî ku çend dîn û şêxên wan hebûn lê yek ji wan bêtirî hemû hevalên xwe bûbû xwedî nav û deng û navê wî heya li wan çend gundên derdora Mîrka jî belav bûbû, helbet taybetiya vî kesî jî ji ewê yeka, ku wî karîbû van herdu nihadan di xwe de biçîne, dihat û navê wî kiribûn Şêxdîno.
Rojekê ew ewê faytûna, ku ji xwe re weke malekê dijmart û şevên xwe tê de dadirivandin, li dû xwe dixuşîne û bi wan sirt û pesaran dikeve, piştî êşeke dijwar û pir cobarên xwêdanê ew tev faytûna xwe dighe sirta herî bilind ku ji wir de çend şivîle bi ser gundê Mîrka de diherikin.
Di evê derketina serê sirtê de, Şêxdîno bala gund

dikşîne ser karê xwe, lewra gava ku ew li depelkê herî jor li faytûna xwe siwar dibe dinire ku gund bi tevayî derketine ser ban û sewkiyan û li wî temaşe dikin, ew jî evê keysê ji dest xwe bernade û bi hildana navê Xwedê re ew xwe bi ser gund de berdide û dihêle hêl-hêla gundiyên wî bilind bibe û navê Xwedê û Pêximber bête hildan…
Erê Pêximber li Boraq nêşt û çû qatê ezmên ê heftan lê Şêxdîno jî li faytûnê nenîş?. Bes ew negihîşt geliyê Tîran.
90
(4)
Bi kopalê dawî re mazovan belav dibin û xwediyên zêvê didin rex hev û bi sema û lîlandin bûk û zêve didin nav xwe. Çend keçikên nuhdighîn jî xwe nêzîkî bûkê dikin belkî ew karibin fîstanên xwe di yên bûkê bidin, zaro jî li dora wan dizîvirin û seriyên şêkir di bala wan de ye. Kirîfên reben jî bi zûrne û daholên xwe dixwezin bal û dilê xwediyê dewatê bi ser xwe ve bikişînin da ku wan di nav lîlandin û lingên mazovanan de ji bîr nekê; “Çawa me li derve û li ber van kurbayên zivistanê bihêle, em di sibeyên rojên havînê de xwe li ber agiran germ dikin, ma qey ew nizane ku kirîf bi hûnikê re arsimî dikevin”. Kirîfê ku dide daholê dibêje hevalekî xwe û herdiçe, ew kopalê xwe germ dike.
Mazovan belav dibin piştî ku bûk û zêve dixin odeya wan, tenê diya bûk û zêve li ber deriyê wan û li benda nêşana keçanî û mêraniya law û keça xwe rawestî dimînin. Bavê zêve jî di oda dî de diçe û tê; li benda pîreka xwe ye, ku ew jê re mizgîniya mêraniya lêwik bîne da ku ew jî

devê teka xwe di derî re derxe û mizgîniyê, bi du bireyan, ji gundê Mîrka re biweşîne.
Di vê dema ku ewî nedikarî tutiştî din bibhîsta kirîfek seriyê xwe di derî re dirêj dike û bi dengekî qut-qutî dibêje wî; “Ez benî bi Xwedê kabokên me ji serma re ziwabûn, ji kerema xwe bêje zaroyan bila cihekî ji razana me re peyda bikin”. Lê her ku wî gotinek dikir carekê li çavê wî dinêrî û vêre jî li destê ku tek têde dimeyizand ku ew ber bi zikê wî dirêj kirî lê na.
91
Bi gotina dawiyê re tirsa wî bi cih tê û xwediyê dewatê bi ser wî de diqîre; “Ez li çime û ew çi ji min dixweze. Tenê hûn ji min kêmin, de rahêjin defik-mefikên xwe û dêv bi malên xwe din; we pereyên xwe sitandin ma hîne çiyê din ji min dixwezin”. Lê kirîf zû-zû wî bernade û her ku dengê ewran xortir dibe û çavên wî bi birûskan dikeve û têderdixe ku ewê heya bi heftnîvşevan negihên mal, berger û lavlavên wî kûrtir û bilindtir dibin û gava xwediyê dewatê dibîne ku nema gotin bi wî kar dikin, ew radihêje tekê û li wî nîşan dike, dihêle ku ew û hevalên xwe heftgedûkan bi paş xwe din.
Ji berî ku ew ji gund bi derkevin û li ser milê rastê çavê wan bi Husê kal dikevin ku ewî ji ser pişta ban de li wan dinire. Ew dîtina wî weke keyseke dibînin ku xwe li gedûka mala wî badin û gazinan jê bikin ku wê şeva sar û tarî di bin baskên wî de biborînin. Derbasbûna wan di gedûkê re dihêl Husê kal mîna pisîkekê xwe di sancê werke û ji dervayî mal bêje wan; “Bi Xwedê heya wîn li

hewşêne, ezê ne li malbim. Qey hûn dixwezin ez jî wekî we li derve bimînim û pîrek dûvê me gişa di ber me re ke”. Ew li hev dixurcilin û ji neçarî, û nemaze dema ku seriyê pîreka malê û sibirkeya di dest wê de dibînin, ji hewşê derdikevin û yek bi nîvdengekî bilind dibêje; “Eger ku kewran kete hewşê, seg dê xwe di kimanan werkin”. Bi gotina wî re ew li dû hev rêzdibin û ji gund derdikevin, heya wê hîngê jî rişrişka baranê dest pêkiribûn.

(5)

Rojekê jî helbestvanekî me, helbet wê hîngê nedizanî dê bibe helbestvan û ne jî koma zarokên bi wî re, ku derketibûn binê gund, geliyê herî kûr û karikên wan jî li

92

pêşiya wan diçêrîn. Ev koma zaroka bi xwe û lîskê de dikevin û da ku ew ji lîska xwe neyên birîn, ew çend hevalên xwe, yên ku gûça wan lê dibe, ber bi mal ve dişînin; Şîtka cîranê Mîrka ne, da ku xwarinê ji wan re bînin.

Zarşivan, xwarina wan dê nanê ku bi xwê hatibe sitiran û penêrê ku bi kela ava şorê hatibe girtin û di rojeke biharê û piştî lîskeke dijwar ewê nepirsin ziko te çi xwar û çi nexwar, bêyî ku bê bîra tukesî ka av bi wan re heye yan na. katek di ser xwarina wan re naçe û ziman di devê wan de dibe kulavekî ziwa û bi sû-sê girdavan ew xwe dighînin cem sarinca jorî gundê Mîrka.

Erê ew gihîştin ser sarincê lê çaxa berdana cot û vegera şivanan çûbû û zû-zû rêvêketina, ku yekî li şûna danê nîvro mayî dê bi wir neketa da ku ew karibin sîtila wî jê

bigrin û hinek av ji sarincê hildin. Lê pir dirêj nakê û cotariyek digel dewarên xwe ve bi wir dikeve û avê ji dewarê xwe re berdide oliqê kevirî.
Piştî ku ew û dewarê xwe têr av dibin, zaroyên ziwa sîtila wî jê dixwezin da ku ew jî karibin ziwabûna xwe vemrînin, lê mêrik bêguhdana bergerên wan sîtila xwe dixe xurcika xwe û ji ser sarincê verê dibe û hêsrê çavên wan bêtir tîr dike. Çendekên din tên lê hemû radihêjin sîtilên xwe bê yî ku tu kes li ziwabûna çavên wan bipirse. Dema ku zaro bêçare dimînin û bi berdana avê di oliq de, ji aliyê cotariyê herî dawî ku bi ser sarincê ketibû, û ji berî ku dewarê wî dêv têxêne avê, çend zaro û bi hev re seriyên xwe dixînin oliq û rê li pêş dewêr digrin, lê M. Hemo dest davêje sîtila dest wî û jê distîne û bi valakirina wê re êşeke tûj di hinava wî de derdibe.
93
(6)
Carekê jî rihsipiyên gundê Mîrka li hav dicivin û biryara rê dûzkirina ku gundê wan bi riya giştî ve girêdide distînin û ew roja din dikin roja sozkombûna xwe; “Hesin hîne germe bikut”. Kesek dibêje civatê û li ser evê sozê belav dibin.
Piştî ku herkes dighe mala xwe û derengî şevê heryek dibêje xwe; “Mala me nekeve çima nehat bîra me ku siba heryek dê, ji bo xwarinê, çi bi xwe re bibe”. Piştî evê pirsê heryek dighe ewê baweriyê ku siba cîranên wî dê hertiştî bi xwe re bînin, lê tenê ewê avê ji bîr bikin û bi gihîştina evê baweriyê re, herkes bi razîbûn seriyê xwe datîne ser

balîv û bêxem di xew ve diçin.
Di roja din de, dema ku nîvro dibe û li seriyê hevdu komdibin da ku taştiyê bi hev re bixun bala xwe didinê ku ji bilî avê tutiştî din bi xwe re ne anîne û…. Ew roj ev roje û ew rê hîne wilo nîvbirî maye.
(7)
Mîrka …
…
…
Dilê Kurdaxêye.
Cindirês 2000
94
Rêçikên Gund
(1)
Dibêjin ku mirovekî Ezdî li ber Xwedayê xwe gerî û lav jê kirin ku rizqê wî jî mîna yê cîranê wî yê Muslman bol û fireh bibe. Kin-dirêj, rojekê ji rojên Xwedê û yê Ezdî di xew de bû, Xwedê ferîştekî xwe dişîne û jê re dibêje; Tu yê herî wî bighînî ber qulên ku rizqê her yekî tê re dadikeve.
Dostê me yê Ezdî li pişta ferîştê Xweda siwar dibe û derdikevin qatê ezmên yê heftan, camêr dinire ezmanekî qulquliye, hinek hingî firehin, Xwedê bi xwe jî dikare tê re dakeve û bibe para xwediyê wê qulê û hin qul jî hindî tengin, tena kuncî jî tê re derbas nabe.
Dema yê Ezdî li qula rizqê xwe dipirse, ferîştê ku ew hilgirtî, wî li bin qula herî biçûk disekinîne. Camêrê Ezdî wê hîngê tê dighe ku çima ewî hertim sêfêl û perîşane, ji

qehra û bi bihana ku qula rizqê xwe fireh bike, bi kerb û dilşewatiyeke kizirî, tiliya xwe li wê qulê dide.
Bi qêrîn û êşeke tûj, ku di paşiya xwe de dipelîne, ji nav nivînan tê avêtin û tê derdixe ku wî tiliya xwe di paşiya xwe de çikandî.
95
(2)
Dîsa dibêjn ku meleyekî Muslmanan di nav çiyakî re derbas dibû û di devereke teng de zibûnê wî bi ber kelemê dikeve û tê kişandin. Ji yê meleye ku yekî ew girtî û dixweze çend peran bide wî, ew ji bo wê yekê di cihê xwe de bê liv dimîne û dema çaxa nimêja nîvro dibe, bêyî ku xwe bilivîne û li pê nimêja xwe dike û bi dengekî bilind lavêjan ji Xwedayê xwe dike.
Ji bedşansa wî bû ku niçîrvanekî xwe di wê kelemê de veşartibû û çavnêriya wî dikir, de ka çêroka wiyê di ku de û çawa kuta bibe, lê gava lavêjên mele dibîse, ew xwe nagre û her ku mele lavêjekê ji Xwedê re hildide û xwestekekê ji wî dike, yê niçîrvan bi gotina “na” bersiva wî dide.
Di dawiya dawî de û piştî pir berger û nayên ji aliyê niçîrvan – Xwedê ve, meleyê me bi qehir bi zibûn digre û dikşîne, bi wê kişandina wî re, zibûn diçire û dibe du perçe û pêre jî ew dibêje Xwedayê xwe.
- Bila tu jî zanibî ku min nimêjên xwe bê avdaz dikirin.
(3)
Carekê ji caran, rihme li dê û bavê guhdaran, kalemêrek radihêje tenekeyekî dimsê şêrîn û mîna gundiyên xwe dêv

dide bazara bajarê Efrînê da ku bifroşê û ji xwe re şirwalekî bikire.
Kalemêrê me tenekeyê xwe dixe nav nigên xwe û bi dengekî duduwan bang dike.
96
- Werin dimsê Entabê.
Çendekên nêzîk li seriyê wî kom dibin û ji kalemêr dixwezin ku ew devê teneke veke da ku karibin wê biçaşin. Tiliyek ji vir yek ji wir, dihêle dimsê kalemêr li tevayî gorepana bazarê belav bibe û mirov, mêş û kelmêş êrîşî ser wî tenekî bikin.
Dem dizîvire, ro dighe dev–devî nîvro û kalemêrê me hîn li çûçika rûniştiye û tenekeyê wî jî di nav linga de ye. Ew dinire ku ji dûr ve yekî xwe lê girt û hat, heya bi wê hîngê tektûk li bazarê mabûn. Gava ew camêr tiliya xwe bi têneke ve dike, pirtinî bi devê wî dikeve û dibêje yê kalemêr.
- Malxerab, ev çiye.. bes tu nebêjî ku min dimsê te tirşkiriye.
(4)
Rojekê jî pîrejinek, û piştî ku çend rojan mastê bizina xwe ya sêwî guhandibû hevdu, ew ketibû ser riya bazara Şiyê. Wê pir hêvî û xwestek di ber dilê xwe re dibirin û tanîn û di nav wan de winda bûbû, geh digot: “Ezê dolemeyeke xwe bikirim”. Piçek nediçû ew doleme bi şalekê diguhert û di dawiya dawî de li kîlok hene rawestî. Gava dighe wê yekê, ew bi firotina mastê xwe dirame; divê hinekî biha bifroşe da ku karibe kîloyê henê bikire û

bi dîtin û pirskirina zibûnê yekê re ku kîloyê mêst bi panzdeh perên Sûriyê nafroşe, pîrejina me seriyê xwe vediçerpîne û helbika mêst ji ser seriyê xwe difirîne, mastê
97
çend rojan li ser riya bazara Şiyê belav dibe û pîrejina reben bê porê henekirî vedigere mal.
(5)
Di gundekî weke gundê Qermîliq de, helbet dê bizin û mirîşk bi bin têlên sînorê kevin û dîsan jî dê netiştekî nuh be ku em bibêjin; Di gundekî wilo de ku ji bilî ezmanekî rût û dûr û wan çend mirîşk û bizinan lê tinebe dê bihêle ku xort ber bi bajar û welatên biyaniyan ve birevin û bihêlin ev kalepîrên van gundan, rojên xwe bi çêrandina van mirîşk û bizinan li dor têlên sînorê biqedînin û bi wan şabibin.
Di rojeke buharê de ku dihêşt dilê yekî bi xwarina kerengan biponije, Heso û Meyrê ji mal bi der dikevin piştî ku, wan çend karik û herdu bizinên gurî didin ber xwe. Dûr-nêzîk ew dighên Lêçe da ku ji leşkerên Turkan bi dûrkevin û çavên wan ên şîn nebînin. Lê ji bextreşiya wan û ji berî ku kalê Heso wan çend pîvokên ku bi xilç hilkişandibûn bi pîra Meyr re buxe, carekê radibe ser xwe û dixweze binire ka karik bi ku ve şimitîne.
- Meyrê, em û karikan ve çûn. Ew bi gotinê re xwe di zinarê, ku derketibû ser, werdike.
- Çi çêbû. Pîra Meyr dipirse û teneya pîvokê di gewriyê de disekine.
- Laşkerên Turk an em hilînan. Kalê Heso, bi rûyekî

beravêtî, bersivê dide.
98
- Malxerabo, min got qey çi çêbû. De rabe her pêşiya karikan û wan bi ser me de vegerîne. Pîra Meyr, bi dilekî sar, jê re dibêje.
- Ma hîne çi ji vê yekê xerabtir heye.
- Bêzirav ma em çiqasî dûrî sînorê ketine, ewê ji me çibkin û bi ser de jî yên gunehkar ewin; ew drbasî nav erdên me bûne. De rabe here û karikan yalde.
- Ez ne ji bona ku em nêzîk an dûrî sînorê ne ji wan ditirsim.
- Ma çiyê din heye da ku tu ji wan bitirsî; tu ne yekî çeteyî ku te sînor talankiriye û ne jî kesekî xwîniye û tu ji wî alî reviyaye vî alî da ku tu ji wan bitirsî û ne jî bihna konevaniyê ji te tê da ku tu ji ber wan bazdî. Pîra Meyr, cara dawiyê, bi sertî jê dixweze ku ew here û karikan bîne.
- Na bi Xwedê ez naçim; ezî çîlim û ditirsim ku leşker çavên xwe di min de pîs bikin. Piştî bêdengiyeke ku bi dudiliyê dagirtî, kalê Heso careke din dêng li pîra xwe dike û dibêje; Here û wan karikan ji nav lepên wan gawiran derîne.
(6)
Şêx Hesenê Belê digel mirûdên xwe li gundê Kora dibe mêvan, eger ku em nebêjin bi sedan lê bi dehan kalemêr ên ku bi temenê xwe ji wî mezintir jî hebûn û ew li destên wî vedipekîn û bi dilekî gerim û tijî tirsa ji Xwedê û rihên Şêx, ew li benda gotinekê, nîşanekê ji wî disekin in.
99

Şêx, nimêja sibê li ber gora pêximber dike û ya nîvro di mala Xwedê de û ya ber êvarê jî li Beyt el Meqdês û eger ku ew ji dostekî xwe, ji ên Şamê, nexeyidî be, ew vedigere û nimêja êvarê li mizgefta Omewî dike û di van çend salên dawî de, û piştî ku rêkxistina Navnetewî Îraq dorpêç kiriye, ewî nikarîbû biçûya mezelê Kerbila da ku nimêja yasîna li wê derê bikira, lew re ew ji bêçariyê vedigerî mal û nimêja xwe di nav koma zaroyan de dikir.
Helbet mirûdên wî ji berî me pê ramiyan; ew çima naçe û li bajarê Qim nimêja yasîna nake, lê wî vedigerand û digot; “Ez naxwezim têkevim şerê di navbera mezhebên Îslamê de û bibin aliyek”. Tiştê din, helbet tufirokên Şêx tunebûn ku vê gera fireh bike; ew bi keramet û rûmeta ku Xwedê bi serde barandibû difiriya, ma qatê ezmên ê heftan dûre an ev derên ku Şêx lê digere.
Di vê civînê de jî Şêx hinekî xulmaş dibe û piştî ku ew lerzînekê dixe laşê xwe û bi gotina; “Xwedê mezine” çavan vedike, mirûdên wî bi yek dengî lê vedigerînin û yek ji wan xwe davêje nav agirê ku xwediyê malê ji bo bijartina laşê berên bilind kiribû û gava ku bihna don û goştê mirûdê di nav êgir de bêvila hinek mirûdên din dişewitîne û ew dixwezin hevalê xwe yê nav êgir rizgar bikin, Şêx bi dengekî bilind li wan dike qêrîn û dibêje; “Hûn ne ji Xwedê pirtir dadwer û dilovantirin, ka vegerin rojên wî yên ji berî ku ew bibe mirûdê me û binirin ka wî çi kar kiriye, kî kuştiye û Xwedê wilo li ser eniya wî nivêsiye ku ewê bi dû me keve û bi vî awayî jî ji dinê barke”. Bi gotina dawiyê re, deng bi ber gundê Kora

dikeve û dê pir carên din Xwedê mezin bikin.
Piştî ku bihna don û goştê beranê bijartî dide ser yê mirovê ku bi qêrînên xwe ve di gelî û newalên gund de
100
winda bûbû, jina malê xwarinê li pêş wan rêzdike û dihêle Şêx Hesenê Belê û mirûdên wî di donê xwe de biqijilin; li şûna ku seriyê berên pê pêşiya Şêx, ew dinirin ku gêrmiya rij daniye ber wî û, bi ser derdan de jî, sênîkên mirûdan bi goşt dagirtiye.
Gava ku ji bo evê yekê, û ji berî Şêx, mirûd li xwediyê malê dikin qêrîn, pîreka wî ji piş derî der dikeve û dibêje.
- Şêxê min de kerem ke, seriyê berên di bin girarê de ye.
(7)
Ew bi bîrxistina navê Xwedê radibe û bi yê pêximber rûdine, hertim tizbiya wî mîna ejdehakî kesk di nav tiliyên wî re dixweşe û çeq-çeqa teneyên wê ber bi ezmanê heftan ve dikşe. Her ku wî teneyek berdida pêre jî, carekê, navê Xwedê bi bîr xwe dixist.
Ew mezin dibe û xeleka mirûdên wî fireh dibe û dibe; ji dûr welatan tên serdana wî da ku xwe bi dawa Şêx misdin û carekê çavên xwe bi dîtina wî ya pîroz bişon. Dibêjin; dîtina wî sereka heft dermanaye, hertim ronahî ji wî dibare û çavên wî jî du rokên di ezmanê eniya wî de ne.
Ew di rojekê de bi tena xwe di odê de rûniştibû, ew jî netiştekî normalbû ku kes li dora wî tunebe û ev tişt dê bihêle ku bihna wî teng bibe û bixweze ji odê derkeve ser ban, piştî ku deng li jina xwe ya sisiyan bike û çaydanek

çay jê bixweze.
Ew di kuncikê ku siya dara tiwiyê avêtibû ser de rûniştibû, hinek mêşên hunguv ku dem şaşkiribûn ber bi
101
darê dihatin û gava wan didît ku hîne tiwî şêrîn nebûne, ji nuh ve direvîn, lê hinekan jî dihêştin ku bihna Şêx, ji wan, teng bibe; demên ku êrişî piyala wî ya çayê dikirin.
Ew hîna di wê tevizandina xewkî de bû û lêva piyalê dimêt dema ku gurpînî bi dilê wî dikeve û dibîne heyveke neh salî li ser banê cîrana dilîze. Şêxê Mila xwe diguvêşe ser hev û careke-dudiyan bang li Xwedayê xwe dike ku ji bilî du çavên wî, ji wî, nehêle û ew jî di ser banên cîranan re hilpekin da ku li ber nigên heyva neh salî rawestin, lê dema dibîne ku keçikê dolemeya xwe hinekî dîtir bi jor ve hilda, ew parsûyên xwe dişkîne û lingên xwe dixe zikê xwe; her ku ji wî tê ew xwe kom ser hev dike û dike ku xwe di quleke dîwêr de veşêre da ku bi rihetî li wê binire. Lê ev hemû tevdîrên Şêx bi kêrî wî netên; dema ku keçik seriyê wî dibîne û bi gotina “Yadê” û tirseke mezin re, ew direve xwar.
Ew, carek din, pelê nivêsandî û mîna berbejna ku li hev pêçayî dixe destên wê û jê re dibêje; “Tu ne bi hewceyî ku ez, careke din, ji te re vegerînim; ez dibêjim te dersa xwe ezberkiriye. Tu yê vê berbejnê têxe deverekê ne ku tukes rastî wê neyê û ne jî tu bavêjî nîvê odê ku bi bermala jina malê re bê hilmaştin, bêyî ku tukes bala xwe dide wê. De rabe her ser karê xwe; Xwedê evî karê te ji bîra nake û ferîştên ku li ser milên te, evan rindiyên te ji te re

dinivêsînin”.
Ew çend rojên din jî li benda cîrên û berbejna xwe dimîne û di rojeke buharê de ew cîran bi saweke berz dikeve hundir odeya Şêx û ji ber derî de, bi çarlepan, ber bi Şêxê xwe dixweşe û destên pîroz radike ber lêvên xwe û datîne ser herdu çavan: Piştî ku Şêx rê dide wî da ku xwesteka xwe jê re bibêje, ew bi destine lerzokî ewê
102
berbejnê ji bêrîka çêket dertîne û ber bi Şêx dirêj dike. Bêyî ku çavên wî vêkevin ew dizane dê çi bide dest wî, lê gava ku seriyê berbejnê dibîne û tugûmanên wî namînin ku ya wî nivêsandiye û hîne ew pîneyê ku ji derpiyê xwe yê kevin qetandibû û pê pêçabû li sere, bi dengekî bilind û kûr navê Xwedayê mezin hildide û du-sê caran seriyê wî li nav lingan û li dîwarê di pişt wî de dikeve.
Ew heya bi demekê tevizandî û xwe bê deng dihêle û piştî ku dinire cîranê wî mîna mişkekî xwe di qucekî odê de çelmisandî û bi xwendina sawên di rûdêmê wî de, ew baş tê derdixe, eger ku ne keça wî lê heya canê wî jî bixweze dê gorî wî bike. Lew re bê dudilî nivîsa di berbejnê de ji wî re, dixwîne; “Evdê Xwedê, silav û pîrozên Xwedayê mezin li ser te barîn, gava ku bi fermaneke Xwedayî, ji te, hate xwestin ku tu keça xwe li Şêxê xwe mehirke û her ku ev yeka bi lez bête kirin ewqasî rindî ji te re tête nivîsandin û tu dihêle hatina Xidir, ku em giş li benda wî ne, zûtir be”. Heya bi demekê ew tênagihe ku ev xewneke an bi rastî li hizûra Şêx rawestiyaye; “Keça çi û halê çi, wê hîne neh saliya xwe

kuta nekiriye”.
Lê ji berî ku ew ji têneghêştina xwe şiyar bibe, heyva neh salî, di nav lepên Şêxê heftê salî de, tête vemirandin û qêrîna wê di guhekî qul de diçelmise.
(8)
Bûdik mir û gerekbû ew bête şûştin, erê camêr belkî di temenê xwe yê ku heftê salî dirêjkiribû, û weke hûn dizanin ku ev temen di rojhilat de pir dirêje û têra yekî
103
dike ku têr birçîbûn û zilm û zor bibe û yek bawer nake dê çawa bi Erza-Îl bide fêmkirin ku ew bilezîne û zû canê wî bistîne û ji vê dinya, ku ji hineka re kanî û ji yên din re fanî, rizgar bike û dû re çi dibe jî bila bibe û wî bi ku ve dişînin jî ne xeme, bes ew ji dîtina cendirma û çavsoran xelas bibe. Piştî evê kelê ka em ji nuh ve vegerin çîroka mirina Bûdik.
Weke me dît piştî temenekî dirêj û riswa ku hêştibû tugundên Efrînê nemabin û wî çîrok û konê xwe li ser bênderên wan venegirtibe û bi pirs û destvegirtinan jiyana xwe li wan deran danerivandibe, yekî weke vî, helbet dê nasneke ku serşûştin çiye, û ji bilî wan çend carên ku xwe di curnika de gevizandibû, netê bîrê ku tucaran laşê wî av dîtibû, heya demên ku baranê jî lêdikir, ew bi dilopên wê hestnedibû ku dighên laşê wî; Bi hezaran tav gerekbûn ku qirêjiya wan salên dirêj bişo.
Çend kesên ku mala wan nêzîkî bêndera bûn, li ser dengê giriyê pîreka Bûdik şiyar dibin, lê piştî ku ew têdighên çîrok çiye, ji nuh ve, seriyê xwe datînin û gava

ku pîreka yekî ji wan dibêje mêrê xwe; “De ka em herin û deng li mele bikin, bila bang li gund bike û heya ew kom dibin, mele jî ê wî bişo û emê wî bi tîrêjên rokê ên berwîlî re veşêrin”. Camêr mitêlê bi ser seriyê xwe ve dikşîne û dibêje jina xwe; “De bitemir, ew evqas sal di qirêjiya xwe de digevizî, de bila du katên din jî tê de bimre”.
Tîrêjên rokê kevin jî dibin û ji bilî çend kesan li dor termê Bûdikê me kom nabin û ne jî meleyê mizgeftê li xwe datîne ku termê wî bişo û nêzîkî wan deran jî nabe. Mabû ji mecbûrî ku feqeh Şelîm bi karê şûştinê rabe û dema çavên pîreka Bûdik li sibirka dest wî dikeve ku ewî mêrê wê bi sibirkê dişo kir ku bibêjêyê.
104
- Gû dikime vê şûştinê. Lê wê, ji zûde, zimanê xwe daqirtandibû.
(9)
… Xwedê winda bû.
Cindirês 2000
SERDAR ROŞAN
çîrok

MIŞK Û MIROV

John Steinbeck
Werger: Firat Ceweri
NUDEM
MIŞK U MIROV
John Steinbeck
Werger: Firat Ceweri

Weşanen NUDEM
Weşanen NUDEM: 2
Mişk u Mirov
Capa Yekem 1993
c Weşanen Nudem
Pergala berg u rupelan: Nudem
Weneya berge: Nive tabloya Bş Liljefors
ISBN: 91-88592-01-4
John Steinbeck
(1902-1968)
Digel ku diroka Amerikaye ne ewcend direj e ji, disan Amerikaye gelek niviskaren nemir derxistiyeş Jack London, Ernst Hemingway, Faulkner, John Steinbeck, Mark Twain u geleken dinş ş ş Le car caran mina ku John Steinbeck hatibe jibirkirin, nave wi mina nave Faulkner u Hemingway naye bihistinş Xelatgire Nobele ye 1962*an John Steinbeck, ne bi tene di capa Amerikaye de, herweha di capa dinyaye de ji niviskareki mezin u xwediye ciheki bi rumet eş Xwendevanen kurd wi bi romana wi ya heja The Grapes ofWrath " Tiriyen Xezebe" nas dikinş Digel ku John Steinbeck behejmar berhemen mina Tiriyen Xezebe afirandine ji, disan ew betir bi ve romana xwe ya kuri Of Mice andMen "Mişk u Mirov" te naskirinş
Min bi xwe ne zude, beri niha bi demeke kun ev roman xwendş Paşe ji ji şansa min ya ce re, ew mina piyes dihate leyistin; min cu piyes ji ditş Pişti ditina piyese, min biryara xwe da ku ez ve romane wergerinim kurdiş Mixabin ku min nikaribu ew ji zimane we ye oijinal wergeranda, le min ew ji ber wergera swedi u du wergatn tirki yen cihe cihe wergerandş Hem bi zimane we ye orjinal, hem bi swedi, hem ji bi tirki nave romane plural e, le, li gori qaide u rezimana kurdi,

semaveke plural li romane nehat; yani me nikaribu nave we bikira "Mişkan u Mirovan" le me "Mişk u Mirov" daniş
Di sala 1937'an de Steinbeck ve romana xwe ya kurt peşi mina piyeseke dinivisine, dixwaze ew mina piyes li ser dik u sehneyen Amerikaye bete leyistin u jiyana miroven di civate de jibirbuyiji aliye raya gişti ve bete zaninş Le, tu kes naxwazin ve piyese bileyizin u herweha tu weşanxane ji xwe nadin ber capkirina we ş Ev yeka han hebeki dile nivisker dişikine, baweriya wi sist dike, le niviskare me ji ser ya xwe danakeve, mijare ji dest xwe bemade u we di eyni sale de mina romaneke dinivisineş Ev romana ku di derheqa serpehatiya du mirovan; Georgee hurik u biaqil u Lennieye girs u kemaqil, an ji mina zarokeki saf de ye, ciroka jiyana karkeren ciftlikan eş Herdu heval ji hev naqetin, bi hev re ji bo kar dikevin riyen ciftlikan u ciftlik bi ciftlik digerinş Ew mina goşt u neynuke bi hev ve ne, her tişten xwe bi hev re par ve dikin, heta ew şiiiken xewn u xeyalen hev in jiş
Mina xwendevan, mirov bi xwe ji dibe şiiike xewn u xeyalen wan, bi wan re radibe, bi wan re rudine, serpehatiyen wan dijiş
Bi heviya ku we niviskaren kurd bala xwe berdin ser wergere, em romana niviskare nemir John Steinbeck "Mişk u Mirov" peşkeşi pirtukxaneya kurdi dikinş
Fş Ceweri
Cend mil li başure Soledade, ceme Salinase
kendale girik dalese, ava wi li wir dicive, kur dibe,
renge wi kesk dibeş Ava cem şirgermiye jiş Ji ber ku
beri ew li wir bicive, ew li ser quma zer ji roje biriqiye
u herikiye wirş Li aliyeki cem giriken biriqandi, li du
hev heya bi ciyayen Gabilgine bi rez Inş Li aliye cem ye

newale ji rezek dair li ber cavan dikeveş Ev daren ku biharan
rengen wan kesk dibinş pelen şaxen wan yen
daketi di gemar u qilcixen lehiyen zivistane de
diminin, daren bih u cinaren ku şaxen xwe yen spi
berdidin ser ava civiyayi u li ser we qubikeke cedikln
inş Li hela newaleş li perre bi qum, pelen ku ji daran
diweşinş li erde dibine mina xaliyeke qalindş Ev xaliya
ha wilo hişk eş ku ger gumgumokek di ser re here
xişxişa we di felekan re derdikeveş Kiroşk evaran ji
nava deviyan derdikevin u ten li ser qume ditelinş Li
cihe hewi ye li ser qume ji, şopa lingen racoonanş şopa
pencen mezin yen kuciken ciftlikan u ya simen cetelki
yen xezalen ku evaran tene ave vedixwin, dixuyinş
Di navbera daren biha u cinaran de xaceriyek heyeş
E>v xacere ji şuna lingen zaroken ciftliken dorheleş yen
ku ji bo ketina ave tene ser cem u ji şuna lingen
rewiyen westiyayi ku ji bo behnberdane xwe ji ser
riyen meztn davejin rex aveş buye erdeke hişkş
Li bine şaxeke nizim ya cinareke mezin u bilindş
komek xweli heyeş Ji we xweliye dixuye ku li wir gelek
caran agir hatiye dadanş Ew şaxa nizim a neziki erde
jiş wer ku li ser hatiye runiştandinş qaşil pe ve nema
yeş rut buye u dibiriqeş
Pişti evara rojeke germş di pelan de lerza baye sivlk
dest pe kiribuş Tariti ber bi jori giran ve dicuş Li
peraven qumini, kiroşk mina hekelken bicukş yen ku
ji keviren reş hatibin cekirin, bei ku tev bilivinş
teliyabunş Ji nişke veş ji hela re veş di nava pelen

reş yen cinaran reş denge teperepeke hata bihistinş
Kiroşk hema bi qulusi ber bi kuna xwe ve reviyanş
Cukeki şirinşahoyi ye lingdirej bi tirali meşiya u bi
firina xwe ya giran ve di ser cem re derbas buş Hemu
şoperiyen jiyane ji bo demeke winda bunş paşe du
zilam li ser xacereke xuya bijnş Ew ber bi ava kesk ve
dimeşiyanş Ew di xacereke de bi du hev de meşiyabunş
heta gava ew derketin ser riya rast Jiş ew he bi wi awaye
xwe dimeşiyanş Li herdiwan ji caket u pantoren ji
cawen şin u bi bişkoken sifir hebunş Li sere wan ji
şewqeyen reş i qermici hebun u betaniyen wan li nava
milen wan gerandibunş Peyaye ku li peşiye dimeşiya
bejinkurtş jirş ruesmerş lerzok u awirtuj bu; xeten wi
yen xuyayiş desten wi yen bicuk u zeximş milen wi yen
zirav u pozeki via ye tujik u bi hesti hebuş Ye ku li du wi
dimeşiya Ji berevajiye wi bii, ruye wi bi şikil, caven wi
gir u ciknisiş navmilen wi fireh u keti bunş Ew peyayeki
eceb girs buş Wi mina hirceki lingen xwe bi dii xwe
de dixirxirandin u bi tewşi dimeşiyaş Herdu milen wi
qet tevnediliviyanş ew pe ve daleqlyabunş Gava ew derketln
ser erda rast, merike ku ii peşiye dimeşiya ji
nişke ve sekiniş Tu nemabu hevale wi bi ser wi ve
biketaş Wi şewqe xwe derxist, bi tiliya xwe ya eşede
meşine xwe ji xwe şeqitand u bi tiliya xwe ew dilopen
xwedane je dawşandinş Hevale wi Ji bare xwe avete
erdeş xwe deveru direj kir u ji ava kesk vexwarş Wi
mina hespeki bi celpecelp u bi lez vedixwarş Ye bejinkurt
bi hers ber bi wi ve cu:

- Lenneiş gotş Lennie ewqas vemexwe!
Lennie her ava bedeng dicelpandş
- Lennieş tu e disan weke şeva cuyi nexweş bikeviş
Lennie sere xwe tevli şewqe xwe xiste nava ave u li perave runiştş Ava ku ji şewqe wi diniquti, di pişt stuye wi de ii di cakete wi ye şin de dadiket ser laşe wiş
- Ox, Jiyan heye, wi gotş Tu Ji hebeki vexwe George, tervexweş
George hedika bare xwe Ji pişta xwe dani erdeş
- Ev av weke ku ne pakij e, gotş Biner, bi kef eş
Lennie deste xwe ye girs xistin nava aveş tiliyen xwe tevlivandin u hedika av tev daş Li ser ruye ave xelekin peyda bunş cun seriye wa ali u disan bi paş de vegeriyanş
Lennie bi balkeşi li wan diniheriş
- Binerş Georgeş biner be min ci kirş
George li rex ave runişt u bi lez u bez bi kulman av vexwarş
- Lezeta we ne xerab eş gotş Le bele qet naşibe aveke ku diherikeş Nebeş nebe, ava ku naherike tu vemexweş
Lennieş Le gava tu ti dibiş ger ava lexeme ji derkeve peşiya te tu e vexwiş
Wi hinek av reşande ser ruye xwe, bi destan bin cenga xwe u paş stuye xwe şuştş Paşe wi şewqe xwe da sere xwe u hebeki Ji perave bi dur ketş Wi congen xwe bilind kirin u milen xwe di ser wan re girtinş We yeka han bala Lennle kişand, wi ji eyni wilo kirş Bi paş de vekişiyaş runişt, congen xwe bilind kirin, bi destan bi congen xwe girtin u mina ku beje, gelo ez bi ser ketimş

h George niheriş Ji bo ku şewqe wi tam bişibe ye
George, wiji şewqe xwe daxiste ser biruyen xweş
George bi meliJli li ave temaşe diklrş Dora caven wi
Ji germa roje sor bubilnş Bi hers got;
- Ger wi serseriye şofer em peya nekiribuna em e
heya bi ciftlike bi otobuse bicijnaş Wi gotibii du gav in,
du gav! Le wi teresi em nezi car milan duri ciftlike
danineş Ji ber ku vd nedixwest ew li ber deriye ciftlike
bisekineş şş Merik em xapandinş Hebe tune be we kijcik
lawe kucikan li xwe daneni be ku ew li Soledade rawesteş
Wi em avetin der; ci: du gav re ye! Zedeyi car milan
re hebijş Hewa Ji eceb germ eş
Lennie bi tirs li wi niheriş
- Ci ye kuro?
- Em dicine kil George?
Peyaye bejinkurt deste xwe li şewqe xwe xistş ew bi
heleke de xwar kir ii bi hers li Lennie niheri:
- Demek te ji bir kiriye ha? Dive ezji te re dubare
bikimş Lawo ehmeqş tu ciqas zij Ji bir dikiş
Lennie bi hedika:
- Min Ji bir kir, gotş Ez geleki xebitimş Ez xere Ji xwe
nebinimş Ji bo ku ji bir nekim ez geleki xebiti meş
Georgeş
- Baş e, min fehm kirş ez e Ji te re bibejimş Ma weki
dln ci kare min heyeş Ez e runem u hemiiyi ji te re yek
bl yek bibejimş tu e Jiji bir bikiş Ez e disan Ji seri heta
bini ji te re behs biklmş
- Min pirr xiret kir, le nebuş Min kiroşk Ji bir nekirine

Georgeş
- Tu dev Ji kiroşkan berde kuroş Jl xwe Ji kiroşkan pe
ve tiştek di hişe te de tuneş Heydeş tu niha guhdari bikeş
Ve ceire hewl bide u Ji bir neke, da sere me nekeve
belayeş Tu li Howard Streeteş li keleka re rianiştibu ii te
11 texte reş diniheriş hate bira te?
Keneki dilşa riiye Lennie rohni kirş
- Haş hate bira minş Georgeş hate bira minşşş Leşşş
Paşe me ci kir? Di wir re jin derbas biJbiinş te gotibu
kuşşş tegotibu kuşşş
- Tu niha devje berde be min ci gotibijş Te bira te
gava em ciibiine nivisgeha Murray u Ready vi wsm li wlr
qerten kar u bileten otobuse dabiine me?
- Ere George, Ji xwe te bira minş
Ji nişke ve deste xwe xiste berika xweş Hedika di ber
xwe de pej^vi:
- Georgeşşş qerta min tuneyeş Hebe tune be min e ew
wlnda kiribeş
Ji ber xemginiyeke mezin wi nikEmibu caven xwe Ji
erde rakiranaş
- Te kengi qert stendiye ku tu we winda bikiş gejik?
Ha va yeş her du Ji li vir inş Ma ez tu caran qerta kar
emaneti te dikim?
Ruye Lennie hineki vebii:
- Mişşş Min got belki min xistibii berika xwe
Wi disan deste xwe xiste berika xweş
George dik dik li wi niheri;
- E^v ci ye te Ji berika xwe derxist?

Lennie xwest xasiitiyeke bike:
- Tiştek di berika min de tune yeş
- Derewan mekeşşş Va ye di deste te de yeş EXv e ku te di deste xwe de veşartiye ci ye?
- Bl şeref ne tlştek eş Georgeş
- Ka we bide min ez le binerim!
Heta ku Ji Lennie dihat wi deste xwe ye girti diiri George digirtş
- Ne tiştek e Geoigeş mişkek eş
- Mişk e? Mişkeki bi ruh e?
- Cikşşş naş mişkeki miri yeş Georgeş Min ew nekuştiyeş bi namiisşşş Min ew li erde ditş Min ew miri ditş
- Ka tu wi bide min!
- Ji min mestine George, ci dibe?
- Ka wi bide min!
Deste Lennie ye girti hedi hedi vebiiş George mişk je girt ii avete aliye cem ye din, nava devlyanş
- Te ci dikir ji mişke miri?
- Gava em di re de diciin min bi tiliya xwe ya eşede ew mist didaş
- We caxe dtve tu dev Ji vi xiiye xwe berdiş Ka beje, ma di bira te de ye be em e herine kii?
Lennie peşi ecebmayi maş paşe Ji şerm kir, riiye xwe di nava cimen xwe de veşartş
- Min disan ji bir kirş
- Hey wax, George gotş Baş e, guhdari bike, em e di ciftlikeke de bixebitinş Wek we ciftlika li bakur ya ku

em te de xebit bCinş
- Li bakur?
-UWeedeş
- Ha, rast eş hat bira min, li Weedeş
- Ew ciftlika ku em dicine a li ve derke ye; nezik eş
Em e herin patron bibininş Niha tu li min guhdari
bikeşşş Em e karten xwe yen kar bidine wiş le tu gotineke
Ji nebejeş Dive tu hic deve xwe venekiş Ger ew
fehm bike be tu ciqas beaqil i, ew e kar nede meş Le ger
10
ew peşi xebata te bibine, hingi hemii karen me dikevin
reş Te fehm kir?
- Min fehm klr George, min fehm kirş
- Baş e we caxe, de ka beje, be gava em herin cem
patron tu e ci biki?
- Ezşşş ezşşş Lennie difikiriş Ji fikre xeten riiye wi
dişidiyanş Ez e tişteki nebejimş Ez e qet deve xwe venekimş
- Eferimş bi te re peşketin heyeş Ji bo tu Ji bir neki
cend caran li ser hev bibejeş
Lennle di ber xwe de kire pistiniş
- Ez tişteki nabejimşşş ez tişteki nabejimşşşez tişteki
nabejimşşş
Geoige:
- Baş eş gotş Hem weki ku te li Weede klrş tu e hewl
bidi ku tu tişteki xerab Ji nekiş
Lennie bi şaşmayi:
- Min li Weede ci kir?
-Mate ewjijibirkir? We caxeez naynim birateş tu

e disanji bir bikiş
Rongihiyek di ruye Lennie de xuya biiş Bi dilşahi
qiriya:
- Wan emji Weede qewircmdin!
Geoige bi hers:
- Ci qewirandinş kuro dinoş gotş Em Ji wir reviyan,
ew li me geriyan le wan em neditinş
Lennie bi dilşahi di ber xwe de got:
- Binerş bi namiis min hej ew Ji bir nekiriyeş
George xwe li ser qiime direj kirş desten xwe xistin
bin sere xwe, Lennie Ji, mina wi ktr, Ji bo ku ew dile xwe
texe cih, sere xwe bilind klr ii li George niheriş
George peylvi:
1 1
- Tu dizani be tu ci bela yi? Ger tu ne bi min re biiya ez e
ci rehet biima, we kef kefa min biiya, belki ez bizewiciyamajiş
Lennie biske li cihe xwe bedeng maş paşe bi hevi got:
- Em Ji bo kar dicin ciftlikeş ne wilo George?
- Pirr baş e, baş e ku te fehm kiriyeş Le em e li wir
reizenş wilo icab dikeş
Edi der ii dor bi lez tari dibiiş Tene sere ciyaye
Gabilane ji şewqa roja ku Ji newale bi dur ketibii dibiriqandş
Mgireki mina periskope sere xwe derxistibii u
pel dibiiş Ji herikandina ave qamiş dihejiyanş Ji diir
veş Ji ser re zilamek bi denge bilind qiriyaş yeki din Ji
bersiva wi daş Bayeki sivik ye ku pelen cinaran
hejand hat, le disan seklniş
- George, ji bo ci em nacin ciftlike ii li wir şiva xwe

naxwin? Ew li ciftlike xwarine didinş
George li keleka xwe ziviri:
- Ez e hesab nedime teş Ev der li xweşa min diceş Em e sibehe herin karş di hatine de min patos ditinş Em e sibehe baren ceh hilgirinş şire ku me metiye ew e di bevila me re wereş Ez e işev li ve dere serpişt rakevimş Cane min wilo dixwazeş
Lennie rabu li ser congen xwe runiş ii li George niheriş
- Ma em e xweirine nexwin?
- Em e bixwin, here hinek hejiken hişk bide hevş di tiirike min de se quti fasiili heneş Heta tu hazir bikiş ez e kibrite bidime teş egir dadeş Em e paşe fasulyen xwe bikelinin ii xwarina xwe bixwinş
- Ez Ji fasiiliyen bi avafiringiyan hez dikimş wi gotş
- Em ci bikinş ava me ya firingiyan tune yeş Tu here hemezek qirşik ii hejik bineş Tu dereng nemini haş
12
Wexti der ii dor tari bibinş
Lennie bi cangirgmi rabii ser piyanş di nava erde beyar de winda biiş George Ji li cihe ku xwe le direj kiribil ma Ci bi fikandin Ji xwe re stranek gotş Ji aliye cem ye ku Lennie ciiyeş celpecelpek Ji ave hatş
Georg dev Ji fikandina xwe berda u guhdari kirş
- Belengaze beaqilş vn di ber xwe de got ii fikandina xwe dom kirş
Lennie Ji nava deviyan xuya biiş Di deste wi de tene hejikeki bihe hebiiş George xwe direji wi kir:

- Heydeş gotş wi mişki bide minş
Lennie dest bi listikeke pandomim ya tevlihev klrş
- Mişke ci George? Tu mişk bi min re tune yeş
George deste xwe ber bi wi ve direj klr:
- Heyde, ka wi bide minş Min nexapineş
Lennie rawestiya, bi paş de vekişiyaş mina ku dixwest
baz bide ii xelas bibe, wi caven xwe berdan deviyanş
George qet nijina xwe xerab nekirş
- Ger tu wi mişki nedi min, ez e yeke li ser caven te
bixim?
- Ez ci bidime te George?
- Tu weki berazan dizani ku tu e ci bidi minş Ez wi
mişki dtxwazimş
Lennie bei dile xwe berika xwe tev daş Denge wi ye
hedi ne Scifi bii:
- Cima tu naheliş Ev ne male kesi ye kuş Min ew Ji
kesi nediziyeş Min ew miri, li keleka re ditiyeş
Deste George bi awireke emirdari direj biibiiş Mina
kiicikeki topa ku xwediye wi avetibe neanibe, ew
neziki Lennie buş bi paş de vekişiyaş le disan nezik biiş
George tiliyen xwe 11 hev xlstinş 11 ser we yeke Lennie
13
mişk direji wi klrş
- Min tişteki eceb nedikirş Georgeş Min bi tene ew
mist didaş
George rabu ser xweş heta ku Je hat wi ew mişke han
avete nav we beyara tariş paşe neziki ave bii u desten
xwe hildan Joreş

- Dine mezin! Gava tu Ji bo girtina mişk derbasi
aliye cem ye din bibi, ji te weye ku ez e lingen te yen şil
nebinim?
Wi denge pistepista Lermie bihistş bi awireki sert le
vegeriya:
- Bala xwe bidiyeş mina kereki ye, runiştiye weke
zarokan carcare dike!
Lennie derbasi pişt dare bii, hemezek hejik ii pelen
hişk aninş Wi ew Ji avetin ser we kevnekoma xweliye fi
disan cii ku qirşikan bide hevş Der ii dor edi baş tari
bubiiş Di ser ave re denge basken qumriyan dihatş
George neziki koma hejikan bu ii agir bi pelen hişk
xistş Alavi bi qice qic gurr biiş George tiire xwe vekir ii
se qiiti fasiili Je derxistinş Wi ew qutiş bi şerde ku
nekeve nava alaviyeş li ber egir bi cih kirinş
Geoige:
- Fasiili tera car kesan heyeş gotş
Lennie li aliye egir ye din temaşe dikirş Paşe bi
nerineke ku xwe bispere Xwede:
- Ez Ji fasuliyen bi ava firingiyan hez dikim, gotş
George hers bii:
- Ava me ya ftringiya tuneye, gotş Ji xwe tu her tişte
ku tuneye dixwaziş Ax, ku ez bi tene biima, ez e ciqas bi
hesani bijiyamaş Min e Ji xwe re karek bidita ii ez e Ji
xwe re bixebitiyamaş We tu bela nehata sere minş Min e
tu zehmeti neklşandaş Min e sere mehe penci dollaren
14
xwe bistenda u ez e ji bo ku bi kefa xwe bijiyama

bicuma bajerş Heta ku cane min bixwesta min e hemii şeva xwe li kerxane derbas bikiraş Li xane dibe, li ku dibe bila bibeş min e xwarina xwe li wir bixwara, kefa xwe li wir bikiraş Oxş ci xweş bii, hem Ji min dikaribu her meh ev bikiraş An min e Ji xwe re şiişeyeke mezin ya whiskye bikiriyaş an ez e biciima qehwexane min e ji xwe re bi kaxezan bileyista; an Ji min e şahiyen bilardoye bikiraş

Lennie li ser congen xwe riinişts di ser egir re li hersbiina George temaşe kirş Ji tirsan ruye wi qermici ba

George bi hers dom kir

- Le ez niha ci dikim? Ez te li dii xwe diklşkişinimş

Tu di tu keiri de naye girtinş Ez tekevim kijgm kariş tu e kare min bi min bidi windeikirinş Kar ii işe te tuneye ku tu min vir de ii wir de dibiş Ger bi ve Ji bimine tişt nabeşTu her sere xwe Ji dixi belayeş Tu e ehmeqiyeke bikiş ez e derde te bikişinimş

Denge wi bilind dibiiş bi qirin dipeyivi:

- Tu hirc i lawo! Ji riiye te tişte ku nehatiye sere min nemayeş

Bi denge mina ku keciken biciik zari hevdu dikin, dom kir:

- Min tene xwestibu ez deste xwe bidim kirase we kecikeşşş Min dixwestş ez mina ku mişk mist didimş wi ji mist bidimşşş

- E^v e Ji ku bizanibiiya ku tu bi tene dixwazi deste xwe bidi kirase we? Kecik Ji tirsan veciniqiş tu Ji mina

mişkeki bi we ve zeliqiş Ew qiriyaş ji ruye wan
meriken ku bi dil me ketibiinş me rojek hemii di
hundire kortala ave de derbas kirş Paşe ji bi alikariya
15
taritiye em Ji wir filitinş Tu her dem tişten wrilo dikiş
her demş Heq e ku mirov te texe qefesekeş milyonek
mişk bide te u bihele ku tu bi dile xwe kefe bikiş
Hersbuna wi bi careke daketş Di ser egir re li riiye
Lennie ye xemgin niheriş Paşe şerm kir ii caven xwe
berdan alaviya egirş
Edi dinya baş tari bubiiş Le bele egir Jer ii Jore daren
ku biibiine mina qubeyan rohni dikirş
Lennie di ber egir de hedika xwe bi ihtiyat
klşkişande ba George ii li ser tiitikan riinişts
Ji bo ku George helen qutikan en din Ji germ bike,
wi bere qutikan guhertinş Mina ku Lennie qet ne li wir
be tevdigeriyaş
Lennie bi hedika:
- George! gotş
Bersiv tunebuş
-Geoige!
-Ciye?
- Min henek kir, Georgeş Ez ava firingiya naxwazimş
Ger a niha ava firingiya 11 ber min biiya min e nexwaraş
- Ger hebiiya mhi e bida teş
- Min nedixwar Georgeş Min e hemii Ji te re bihiştaş
Te e Ji xwe re tera xwe bi ser fasulyan dakiraş Min tehm
Ji nedikirş

George her bl wi riiye xwe ye daliqandi li egir meze dikirş
- Ger tu ne bi min re biiya mln e ci kef bikiraş Her ku ez 11 ve diflkirim ez dehn dibimş Ji ruye te ez nikarim deqiqeyeke Ji behna xwe berdimş
Lennie he Ji li ser tiitikan riinişU biiş Li pişta cem, 11 reşaye diniheriş
16
- Georgeş ger tu btxweizi ez e herimş ez e te bi tene bihelimş
- Ma tu dikari heri ku?
- Ez e herimş A ez e herim sere vem ciyanş Qey ez e Ji xwe re şikefteke bibinimş
- Ha wilo ha! Baş e tu e ci bixwi? Bi qasi ku tu tişteki xwarine bi dest bixiniş aqile te tuneye kuş
- Ez e tişteki bibinimş Georgeş Ez li ava firingiyan ii li tişten qenc nagerimş Ez e li derve razemş Xerabiya tu kesi nagihije minş Ger ez mişkeki bibinim ez e bi xwe re bigerinimş Kes naye wiji min nastineş
George bi mereq di ser stiiye xwe re li wi niheriş
- Tu dixwazi bibejiş ku ez bi te re baş nadim u nastinim?
- Ger tu ediji min aciz biibi, ez e herim serc ciyan u Ji xwe re li şikefteke bigerimş Tu kengi btxwazi ez e herimş
- Na, naşşş guhdciri bike! Min henek kirş Lennieş Ez dtxwazim tu li ba min biminiş Tişte xerab, her ku tu deste xwe direji mişkan diki, tu wan dikujiş

E}w sekiniş
- Biner be ez e ci bikimş Lennieş Di firsenda peşi de ez
e cewrikeki kiicikan bidime teş Dibe ku tu wi nekujiş
E^v Ji mişkan cetir eş Hem Ji tu dikari wi he betir mist
bidiş
Lennie bi we nehate serş wi dizanibii ku girani di
aliye wi de yeş
- Ger tu min naxwEiziş vekiri blbeje, ha ez e herim
sere van ciyanşşş Ez e derkevim sere vi ciyaye bani ii ez e
bi sere xwe bijimş Kes Ji nikare mişke min Ji min
bidizeş
Geoige:
17
- Ez dixwazim tu li ba min bimini, Lennieş gotş Kuro,
ger tu bi tena sere xwe li ciyan biminiş ew e bibejin qey
tu htrc i ii ew e te bikujinş Naş naş tu e bi min re bhniniş
Ger xaltiya Clara miribe Ji ew e qet Ji tenemayina te
hez nekeş
Lennie bi xasiikti:
- Ka behs bikeşşş ka, mina her car behs bikeş
- Ez e behsa ci bikim?
- Behsa kiroşkanş
George kurt birri:
- Xwe be sebeb newestineş tu ci bike Ji tu e li vir
biminiş
Lennie li ber wi geriyaş
- Heydeş Georgeş Ji min re behs bikeş Ci dibe Georgeş
Weke her car Ji min re behs bikeş

- Demek geleki kefa teje re teş ha? Baş e, ez e ji te re
behs bikimş paşe em e riinen ii xwarina xwe bixwnnş
Denge George cidi biibiiş Mina ku wi eyni tişt bi
caran gotibeş wi gotinen xwe bi eyni tempoye ducare
dikirinş
- Miroven nola meş yen ku li ciftlikan kar dikinş li
dinyaye tikutene neş Ne kesi wan heyeş ne Ji cih ii
wgiren wanşşş E>v diharin ciftlikeke cend quruşan kar
dikinş paşe gava dadikevin bajerş hemiiyi xerc dikinşşş
Hema gava peren wan xelas dibe Ji ew diherin
ciftlikeke din stiiye xwe xwar dikinş Tişteki ku ew Ji siberoje
hevi bikin tune yeş
Lennie baş dilşa bii:
- Temamşşş temamş Niha tu behsa me bikeş em
cawan in?
George dom ktr:
- Em ne wilo neş E me heviyeke me heyeş Ye ku bi me
18
re bipejnve ii bi me dakeve heyeş Em ne weke wan kesen
be ci ii war inş ku dicin meyxanan ii hemii pereyen xwe
xerc dikinş Ye din ku tekevin hevseş bicehemin Ji ne
xema kesi yeş Le e me em ne wilo neş
Lermie xwe avet nave:
- Em ne wilo ne! Cima em ne wilo ne? Ji ber kuşşş Jl
ber ku ji bo min tu heyi u Ji bo te ji ez hemeş
Bi kef keniya:
- Niha behs bike Georgeş
- Tu ji ber dizaniş tu Ji dikari behs blkiş

- Na, tu behs blkeş Yaş her tlm hln cihan Jl bir dlkimş
Em e ci bikinş beje?
- We ci bibe? Em e rojeke hemii pereyen xwe bldin
hevş Ji xwe re xaniyeki blciik il donimek du donim erd
bikirinş We celekeke me u cend berazen me ji cebibinş
Lennie:
- Em e weke maldaran bijin! bi dengeki bilind gotş
We kiroşken me ji cebibinş Behs bike Georgeş We li
bexce ciye me hebeş bibejeş behsa kiroşken di qefese de
Ji bike, behsa barana ku we zivistanan cawa bibare ii
behsa soba me Ji bikeş Le ew e qejrmaxe ser şir wilo
qalind bibeş ku ancax tu bikaribi bi kere Je biki,
Georgeş
- Cima tu bi xwe behs naki, tu bi her tişti baş dizaniş
- Na, na, tu behs bikeş Behskirina te cihe yeş Dom
bike, Georgeş Ez e cilo li kiroşkan binerimş hi?
- We bexceyeki me ye mezin ye sebze ce bibeş we di
nava kiroşkem de pinikek mirişken me Ji hebeş Gava
zivistanan baran bibsireş em e dev ji kar berdinş paşe
em e xweşik runen, em e li denge peşken barane
guhdari bikin, we kef kefa me beşşş
Wi Ji berika xwe kera xwe ya siisteli derxistş
19
- Wexta min tune ye ku ez he betir behs bikimş
Wi kera xwe xiste bine qutikekeş ew vekir u direji
Lennie kirş Paşe qutika dudan vekirş Du kevci Ji
berika xwe derxist u yek je da Lennieş
Wan li ber egir deve xwe tiji fasiili kirin u zu bi zii

ciitinş Cend fasiiliji deve Lennie pekiyanş
George bi kevciye xwe işaret kirş
- Ger sibehe patron Ji te pirsan bipirseş tu e ci bibeji?
Lennie gepa di deve xwe de daqurtandş riiye wi bi
fikir buş
- Ez e bibejim kuşşş Ha ez tişteki nabejimş
- Aferin! Pir baş e Lennie! Cama tu pirr bi peş
dikeviş Gava du donim erde me cebibeş ez e lenerina
kiroşkan bisperim teş Tew ku wilo tişt bene bira teş
Lennle pir kefxweş biibu:
- Hate bira minş gotş
George bi kevciye xwe işareteke dinji kirş
- Guhdari bike Lennieş tu vir baş nas bikiş Tu dikari
ve dere di hişe xwe de biheliş ne wilo? Ciftlik bi tibabeki
diiri vir eş Ger tu cem hemiiyi bimeşi tu e bigiheji
wirş - Helbet we be bira min, Lennie gotş
Cawa be ez hin bume ku gotineke Ji nebejim ya!
- Ji xwe, ger wilo beş guhdairi bikeş Lennieşşş Ger tu
weki cara bere sere xwe texi belayeş hema baz bide
were virş xwe di nava deviyan de veşereş
Lennie bi hedika:
- Ez e xwe di nava devtyan de veşerimş gotş
- Heta ku ez werim ii te bibinimş tu e di nava deviyan
de veşarti biminiş Ma tu dikari ve di hişe xwe de
biheli?
- Ez dikarim Georgeş Heta ku tu weri ez e di nava deviyan
de veşarti biminlmş
20

- Le tu hewl bide ku sere xwe nexi belayeş an na tu e nikaribi
li kiroşkan biniheriş
Qutiya xwe ya vala avete nava deviyanş
- Naş ez sere xwe naxim belayeş Georgeş Ez deve xwe
venakimş
- Baş e, kisike xwe bine virş ba egirş Em e li vir
xeweke xweş bikinş Li ser me asmane mina qubeyeke u
pel heneş Egir tev mede, bihele bila vemireş
Wan nivinen xwe li ser qume raxistin; her ku alava
egir kem dibu, der ii dor Ji tciritir dibunş Dar ii ber hedi
hedi Ji ber cavan winda biin, ji şewqa cilmisi ya ku
qurme daran dida xuyakirin pe ve tiştek nemaş
Lennie di reşayiye de got:
- Georgeşşş ma tu razayi?
- Naş Tu ci dixwazi?
- Dive kiroşk rengo rengo bin, Georgeş
George bi dengeki xlrmaş:
- Ere, ere, gotş E^v e sor bin, reş bin, kesk bin; Lennieş
We bi milyonan kiroşken me hebinş
- Bila yen pircdirej Ji hebinş Georgeş Te bira teş min
ew li peşangeheke Sacramentoye ditibunş
- Ereş we yen pircdirej Ji hebinş
- An na ez e her u herimş Georgeş ez e herim di
şikefteke de bijimş
George:
- Bicehimeş gotş Denge xwe bibireş lawo!
şewqen sor yen bizoten ku dibiin xweli dlcilmisinş
Li ser girike wi aliye cem denge zurina wawikeke hatş

ji allye din kucikeki bersiv daş Pelen cinaran bi behna
şeve ya sivik dixuşiyanş
21
Xaniye ku karker le radiketinş avahiyeke direj i
carqorzi biiş Ji hundur ve diwar bi kilse hatibii seyandinş
ser xeni Ji bi texten qalind hatibii girtinş Li se
helan pacen cargoşe hebunş Li hela caran Ji deriyeki
giran ku bi ristik dihate girtin hebiiş Heyşt diwanen ku
li rex diwer hatibiine rezkirin dixuyanş Li ser pencan Ji
van lihef raxistibiin, li ser hersiye din Ji lihefen berii
hebunş Di ser her diwaneke re sindoqen sevan yen bervekiri
bi diwer ve mixkiri bunş Ew yen xwediye
nivinan bunş wan alaven xwe yen şexsi dixistineş Li
ser wan sindoqen mina refanş tibabek hur miiren
mina sabiinş podraş gwizanş kovaren Wild West yen ku
karkeren ciftlike li ser dehn dibiin, hebiinş Wan qaşo
heneken xwe bi wan kovaran dikirin, le hiin guh
medine, ew wem kovaran geleki cidi digirinş Li ser
refan dermem hebiin, şiişeyen biciik, şeh ii bi cend
bizmaren ku di stndoqan de kutandibiinş qerewat li ba
dlbiinş Li keleka diwareke Ji wan sobeyekji hesine reş
hebii u liila we tam di nava zike xeni de derxlstibiinş Ser
masa carqorzi ya nava xeni bi kaxezen listike nuxumandi
biiş Li dora mase Jiji bo runiştina listikvanan
sindoqen textini hebiinş
Saet neziki dehe sibehe biiş Ji pencereyeke kelekeş
22
roje tirejen xwe yen ku toze te de bi ayjeni dileylst, berdida

hundurş Meşş mina sterken ku dixurucinş di nava
wan tirejan de diciin u dihatinş Ristika deriye textini
rabuyibiiş Deri vebiiş kaloyeki bejindirej u piştxiiz kete
hundurş Kinceki Ji cawe şin le bu ii melkeseke mezin di
deste wi ye cepe de biiş Bi du wi de Georgeş bi du George de
Ji Lennie kete hundirş
Kalo:
- Patron do evari li bendi we buş gotş Ve sibehe gava
wi dit ku hiin he ji nehatineş ew behawe hers biiş
Mile xwe ye raste direj kirş mile wi di hucik de beberş
mina qutek dar biiş Wi herdu nivinen li ba sobe nişan
dan:
- Hiin dikarin di nava van nivinan de razen, gotş
George nezik bii ii betaniya xwe avete ser cewalen
kayeş yen ku wezifa doşekan diditinş Wi li sindoqa xwe
ya refiki niheri u ji hundire we rahişte qutikeke
teneke ya zerş
- Heş ev ci ye?
Kalo:
- Ez nizanimş gotş
- Li ser ve dinivise ku ew kecan, sirsirkan ii her
celeb kezikem Ji koke ve qir dikeş Hiin ci celeb nivinan
didine me? Niyeta me u hevdana kecan tune yeş
Kaloye xulam melkes xiste deste xwe ye raste, ew di
nava enişka xwe u heta xwe de epişemd u deste xwe ye
din direji qutike kirş Ew nivisa li ser qutike bl balkeşi
di cav re derbas kirş
- Guh bide minşşş Ew hevale ku heri dawiye li vir

razabii hesinker eşşş A rasti ew peyayeki pir baş bu; yek
Ji ew wilo paqij bii ku naye gotinş Wi heta pişti xwetrine
Ji desten xwe dişuştinş
23
- Baş eş cilo biiye ku spi ketine vi cameri?
George hedi hedi hers dibiiş Lennie bare xwe dani ser
nivine li keleke u riinişts Deve wiji hev biiş li George
guhdari dikirş
Kalo:
- Binerş ez e bi bejimş gotş Ji vi hesinkeri re Whitey
digotin - ger kec ii spi tunebiina Ji wi ev toza han li her
dere direşandş Wi digotş ci dibe ci nabeş Tu fehm dikiş
ne wilo?Binerş ez Ji te re bejim be ew ci celeb mirov buş
Wi patate li ser sifre diqeşartinş lekeyeke biciik Ji li
wan nedihişts Ger wi deqeke sor li heke biditaş ew Jije
dibirş Paşe Ji ber ku wi xwarinen vir nediecibandin ew
rabuji vir ciiş
Ev eş ew miroveki wilo buşşş geleki nişmi buş Rojen
yekşeman ger ew necuya ciheki jiş disan wi kincen xwe
11 xwe dikirin, heta wi qerewat ji dixiste stuye xwe,
paşe Ji ode derdiketş
George bi awireki bi şik:
- Gelo te got ew ji bo ci ji vir cii?
Kalo qutika zer xiste berika xwe, riha xwe ya spi ii
mina stiriyan bi destan xurand u:
- EXv cu karşşş gotş E^v wrilo derket ii ciiş Weke her carş
Wiji bili xwarine tu sedem nişan nedidaş Tene şeveke:
"Mafe min bidin min" gotş

George doşeka xwe hilda Jor ii li bine we niheriş Wi
xwe II ser tewand ii cawe we bi diqet di cav re derbas
kirş Hema Lennie ji rabu, eyni bi babete George nivine
xwe di cav re derbas kirş Dawi dawi George dilfireh biiş
Wi kisike xwe vekir, gwizan ş qetek sabun, şehş
şiişeyek tiji hebş melhem, hemii bi rez li ser refan bi cih
klrinş Paşe wi lihefa xwe raxist ii nivinen xwe bi pergal
amade kirş
24
Kalo peyivi:
- Patron li ku be, we niha wereş Ve sibehe gava wi
hiin neditin ew eceb hers biiş IDw raste rast cii cihe ku em
le taşte dixwinş deve xwe vekirş caven xwe girtin; ev 11
kijan dojehe mane? gotş Di ser de ew bi seyis re Ji hers
buş
George ciheki qermici ye nivine xwe rast kir ii
riinişts
- Te got ew bi seyis re Ji hers bu?
- Ere, Ji ber ku seyis reşik eş
- Te got, ew reşik e?
- E, a rasti ew peyayeki qenc eş Pişta wi xuz eş Di
dema xwe de hespe zitok lexistiyeş Kengi sere patron
xerab bibe ew bela xwe di wi dideş Le bele seyis guh
nadiyeş EXv her tim dixwineş Li oda wi pirtuk heneş
- Ev patrone we ci celeb mirov eş yaho?
- Naaş ew ne miroveki xerab eş car caran sere wi le
dlxeş le discm peyayeki baş eş Biner mtn e ci bigotaşşş Tu
zeme be wi di Noele de ci kir? Wi whiskyeke mezin ani

virş got: zarokno, Ji sale careke Noel e, vexwinş
- Wa mebejeş wi zirecebek whisky ani?
- Bawer bikeş newayi di peyva min de tune yeş
Xwedeyoş me ciqas kef kiribu!şşş Wi we şeve destur da ye
reşik Jiş Erebevaneki bicuk heyeş Smitty Je re dibejinş
wi u ye reşik bi nave leyistinş Ye reşik pişta wi da erdeş
Hevalan destiir nedan ku ew lingen xwe bi kar bineş Ji
ber we yeke ye reşik bi ser wi de ketş Smitty got: Ger min
lingen xwe bi kar bianina min e ruhe ye reşik bistendaş
Le Ji ber ku pişta ye reşik qop buş hevalan rast neditin
ku Smitty lingen xwe bi kar bianinaş
Ji bo ku ew tama biranina xwe derexeş pişti ku ew
demeke rawestiya dom klr:
25
- Paşe hemii Ji bo kefe ciine Soledadeş E min ez neciimş
Ez ediji tişten wilo zewqe nastinimş
Lennieye ku bi rastkirina nivine xwe biliya buş tu
nema ku wi kare xwe xelas bikiraş ristika textiki ya
deri rabuş
Peyayeki bejinkurt ii xirp li ber deri rawestiyabiiş
şaleki şinş gomlegekş elegeki bişkokgirti il caketeki
reş le buş Tiliyen wi yen girdike di ber qayişa wi de bunş
şewqeki qehweyi ye kevin li sere wi buş Galiik bi
cizmeyen wi yen kabikbilind ve bun, Ji we Ji xuya bu
ku ew ne karkere rojane biiş
Kalo cavek avete wiş bi deste xwe riha xwe mist da,
Hngen xwe kişkişcmdin ii ber bi deri ciiş
- E}w niha hatinş gotş

Di ber patron re derbas bu ii derket derveş
Patrone cimqelew bi lez ii bi gaven biciik bi peş ve
cu:
- Min ve sibehe li Murray ii Readye dabu nivisandinş
ku hewcedariya min bi du zilaman heyeş Karten we yen
kar bi we re ne?
George li beriken xwe geriyaş karten xwe dendst ii da
patronş
- Suc ne ye Marray ii Readye yeş Li ser ve karte, saeta
ku diviyabii hun li vir amedebiina nivisi yeş
George sere xwe tewand:
- şofere otobuse em xapandin, gotş Em mecbiir man
ku deh mil re bimeşinş He em geleki diir biinş wi gotş
clftlik li vir eş Me ve sibehe Ji tirimpeleke ku em
bianina peyda nekirş
Patronş
- Ez mecbiir mam ku erebeya ceh bi du mhroven kem
bişinimş Ger hiin niha herin Ji be fede yeş Hiin dikarin
26
deme eveire herinş
Wi Ji berika xwe deftera ksirkercm derxistş rupelen
ku bi penuse Ji hev hatibtin veqetandinş vekirş
George mexsiis tuj tiij li Lennie niheriş Lennie Ji bi
işareteke seri tegihiştina xwe da xuyaklrinş
Patron peniisa xwe xwezi kir:
- Nave te ci ye?
- George Miltonş
-Leyete?

George bersiv da:
- Nave wi Lennie Small eş
Patron naven wam li deftere nivisandinş
- iro ci biiş ha biste mehe yeş pişti nivroş
Wi deftera xwe girtş
- Hiin herdu bere 11 ku xebitine?
- Li bakurş li Weede, George gotş
Patron li Lennie ziviri:
-Tuji?
George bersiv da:
- Ere, ewjiş
Patron bi nerineke bi heneki bi tiliya xwe Lennie
nişan da:
- Wilo xuya ye ku ev ne peyayeki phpeyv eş
- EXv ne pirpeyv e, le di kar de kes di ser vd re tune yeş
E^v weke gayeki bi hez eş
Lennie xwe bi xwe keniya:
- Weke gayeki bi hez e, wi di ber xwe de gotş
George tuj tiij li wi meze kirş Lennie bi şermoki sere
xwe bera ber xwe daş
Patron bi careke ve Ji Lennie pirsi:
- Heş Smallş ci kar Ji deste te te?
Lennie kete heyecaneş bi işareteke cavem xwest ku
27
George bi gaziya wi ve wereş
George:
- Tu ci kari bidiye ew e bikeş gotş E^v dikare qantiran
derxe cereş cewalen zad bikişine, cot bikeş Tu ci

bixwazi ew dikare bikeş Ka careke wi biceribine tu e wi bibiniş
Patron li George vegeriya:
- Cima tu naheli da ew bi xwe bersiv bide? Armanca te ci yeş em fehm bikinş
George denge xwe bilind kir:
- Min negot ew zeki yeş hic Ji ne wilo yeş Le bele di kar de kes di ser wi re tune yeş Tu bareki dused kilo li pişta wi biki Jiş ne xema wi yeş
Patron defter xiste berika xweş Tiliyen xwe yen girdike xistin ber qayişa xwe ii caveki xwe qirpandş
- Li min binereş tu ci dolaban digerini?
-Ha?
- Tu ciqasi ji pişta vi lawiki qezenc diki? Ma destmiza wi tu distini?
- Ci munasebetş Demek Ji te weye ku ez wi bi kar tinimş
- Eeeş min di Jiyana xwe de neditiye ku yek ewqasi bi yeki din dakeveş Ci feda te di vi kari de heye, ez we hin blbimş
- Ewşşş ew merive min eş Min Ji diya wi re soz daye ku ez e li wi miqate bimş Di biciiktiye de bargire zitok 11 sere wi xistiyeş E^v mina her kesi peya yeş Tene aqile wi hebeki sivik eş Le ci kare ku tu bidlye ew e bikeş
Patron II wi vegeriya:
- Ji bo kişandina cewalen ceh aqlldariyeke zede Ji naveş Le nebe nebe, tu min nexapini Miltonş We caven min li te binş Cima hun Ji Weede veqetiyan?

28
George hema bersiv da:
- Li wtr kar nema biiş
- We ci kar dikir?
- Cikşşşme kanalizasiyon dikolaş
- Baş eşşş le tu hewl nede min bixapini, Ji ber ku tu e nikanibiş Gelek cawekiriyen nola te di ber desten min re derbas buneş Pişti xwarine hun e herin ceh bikişininş We Ji patozan ceh bete kişandinş Tu e bi refe Slim re heriş
-Slim?
- Ere, ew erebevaneki bi navmil eş Tu e di dema xwarine de wi bibiniş
Ew bi careke ve ziviri, ber bi deri ve meşiya, le beri ku ew derkeve der, disan berepaş vegeriya ii herdu zilam kiir kiir di cav re derbas kirinş
Gava ew cii ii denge lingen wi hate birin, George li Lennie niheriş
- Ka te e gotinekji negotaş Ka te e deve xwe bigirta ii gotin bisparta min? Tu nema bii ku em ji kare xwe bibiinaş
Lennie bi rewşeke bekef diniheriş
- Min ji bir kir, Georgeş
- Ere, te Ji bir kirş Ji xwe tu herji bir diki, paşe hemii kar di stiiye min de dimineş
E^v di nivine xwe de cu xwareş
- Ew e niha merik li me binihereş Dive tu edi hewl bidi ku xeletiyeke din nekiş Dive tu deve xwe Ji bigiri!

Ew bi xemgini xayizi fikirandine bubii:
-GeoTgdş
-Ci ye disan?
- Bcirgire zitok li sere min nexistiye, ne wuo George?
George hers bu:
29
- Xwezi lexsltibaş We hinge xelke de hebeki 11 te
guhdari bikiraş
- Te got tu merive min i George?
- Min derew kirş ci dibe? pir şukur ku min derew klrş
Ger tu merive min buyaş min e xwe bi dar ve btkiraş
EXv bi careke ve sekini, ber bi deri ve meşiya ii li der
ve niheriş
- Li min binerş tu ci 11 wir sekiniyi ii guhdari diki?
Kalo bi gaven giran kete odeş Melkesa wi disan di
deste wi de biiş Kiicikeki şivEman li dii wi biiş rohni di
caven kucik de nemabiiş kiicikeki geleki kal buş Wi xwe
bi kulandin bi zore gihande quncikeke odeş Bi helkehelkeke
mezin xwe li erde direj kirş Paşe wi poste xwe
ye qerşiini ye bi girr alastş Kalo li bendi bicihbuna
heywen rawestiyaş
- Min guhdari nekir, gotş Ji bo ku ez kiicike xwe
btxurinimş min xwe wilo dabu quncikeş Min pakijiya
avdeste he nu xelas kirş
Geoige:
- Te guhdari li tişten ku li vir dihatin gotinş dikirş
gotş Ezji peyen ku poze xwe dixin nava kaire min, hez
nakimş

Kalo bi awireki xemgin li George niheri:
- Ez he nii hatibiim, gotş Min gotinekji ji tişten ku
hiin peyivine, nebihistş Tişten ku hun peyvine min eleqeder
nakinş Li ciftlike guhdarikirina li ber deri ii pirsklrin
ne di cih de yeş
Pişti ku George hebeki nerm bii:
- Te gotineke rast gotş Ye ku nexwaze kare xwe winda
bikeş dive wilo beş
Le gotinen kalo ew dilşa kiribiiş
- Were biske riineş gotş Ev kucike te tera xwe bi emir
30
e
- Wilo yeş min ewji biciiki ve mezin kiriyeş Eh, ew
bere kiicikeki şivanan ye Jehati buş
Wi melkesa xwe speirte diwer, riha xwe ya kever bi
destan mist daş
- Patrone me cawa ye?
- Ne xerab e, peyayeki beiş dixuyeş
- Ew peyayeki baş eş Tene ku mlrov li gori sere wi
hereş
Xortek kete hundirş Xorteki cavreş, porrkurişk ii
esmer biiş Di deste wi ye cepe de lepikeki kar hebii ii
mina patron cizmeyeke kabikbilind di lingen wi de
biia
- We bave min neditiye? lewlk pirsiş
Kalo:
- E^v beri deqiqeyeke li vir bii, Curley, gotş E^v e cube
mitfaxeş

Curley:
- Ka ez biniherim be ew li wir eş gotş
Caven wi li yen ku nii hatibiinş ket ii ew necfiş Wi di
ser re peşi li Georgeş paşe Ji li Lennie niheriş Milen wi
hedi hedi Ji enişken wi hatin xware u kulmen xwe
şidandinş Laşe xwe givaşt ii bi hedi xwe ber bi peş ve
tewandş Awiren wi hem şerker, hem ji balkeş biinş
Gava Lennie ferq kir ku wilo di cav re tete derbas kirinş
wi bi şaşmayi xwe livandş bi tevgerek cantengi lingen
xwe hejandinş Curley hedika nezi wi biiş
- Karkeren nuş yen ku bave min li bendi bun, hiin
in?
George:
- Em niha hatinş gotş
- Biheleş bila ev spindara percivi bibejeş
31
Lennie bi rewşeke şaşmayi vedigeviziş
George berstv da:
-Le ger ew nexwaze bersiv bide?
Curley bi holbuneke re 11 wi ziviri:
- Ger pirsek hate pirsin dive bersiv bete dayinş Hem
tu cima tevli gotine dibi?
George bi awireki be şerd:
-Em her bi hevdu re digerinş gotş
- Haş demek ji ber we ye!
- Ereş ji ber we yeş We ci bibe?
Lenniee ku Ji bo pewistiya we ci bikeş ecebmayi
mabiiş li George niheriş

- Demek tu e destiir nedi ku ev merik bipeyiveş ne
wilo?
- Ger ew bixwaze bipeyiveş ew e bipeyiveş
Wi bi hedika işaretek da Lennieş Lennie bi hedi:
- Em niha hatin, gotş
Curley tik tik li wi niheri:
- Ger careke din tiştekji te hate pirsin, bersiv bideş
te fehm kir?
Geroge ji paş ve li wi niheriş paşe 11 kalo ziviri:
- Eve ha ci dtxwaze? Lennie tiştek bi wi nekiriye kuş
Ji bo ku kalo dlle xwe texe cihş da kes li wan guhdari
nakeş wi bi ihtiyadi li deri niheriş Paşe hedika:
- Guh bide minş gotş Ew lawe patron eş Curley lawikeki
dijwar eş Ew hebeki bi boksan Ji dizaneş Ew
boksereki sivik ii biserketi yeş
- Bila bokser beş Ji bo ci ew be sedem bela xwe dl
Lennie dide?
- Binerş ez e ci bejimş Curley wek hemii miroven
hiirik murik eş E^v Ji peyayen direj en bi navmil hez
nakeş E^v her bela xwe di yen wilo dideş Ji bo ku ew bi
32
xwe bejinkurt eş diqehereş Tu qet li yen wilo rast nehatiyi?
Yen wilo timi nexweşiye derdixinş
- Beleş min bonciken wilo yen cirmexweş plr ditineş
Le ger ev Curleye te tekili Lennie nebe ew e baş bikeş
Lennie ne Jehati yeş le ger sere wi tevlihev bibeş ew e
di dawiye de wi bieşineş
Kalo bi gumandari:

- Ez nizanim, le Curley lawikeki Jehati ye, gotş Ez
hic rast nabinimş Wek minak, ger Curley xwe biaveje
ser yeki direj e bi navmil, herkes we bibeje Curley
şerkereki jehati yeş Le gava ew bixwaze ve bike u ledane
bixweş we her kes li ser sere ye ku li wi dideş bicivinş Ez
ve yeka han qet rast nabinimş Ger mirov bi Curley re
pevbicineş mirov ci bike Ji disan mirov neheq eş
George 11 deri diniheriş Bi awireki tehditkirini:
- Ger ew bela xwe di Lennie nedeş ew e baş bikeş
Lennie ne boksor eş le ew hem bi qewet eş hem ji desten
wi sivik inş Lennie bi usiilen nerm Ji nizaneş
Ew cu ber masa carqorzi ii li ser sindoqeke runiştş
Rahişte cend kexezen listike ii li nava hev xistinş
Kalo Ji li ser sindoqeke din rûniştş
- Van tişten ku ez dibejim tu Ji Curley re nebejiş ha!
Ger ew bibihize ew e min Ji vir biqewirineş E wi ne
xema wi yeş Kes nikare wi biqewirine, Ji ber ku ew lawe
patron eş
George kaxezen di desten xwe de şikand, di ser hev re
qulupandin ii yek bi yek li wan niheriş Pişti ku li wan
diniheri, ew diavetinş
- Ev Carlye han tipeki eceb eş Ez ji bonciken wilo
clrmexweş qet hez neikimş
Kalo:
- Ew di van demen dawi de xerabtir biiye, gotş Ew
33
beri niha bi du hefteyan zewici yeş Jina wi li mala
patron dimineş Ji cirka ku Carly zewici ye ew har bii

yeş
George kire hume hum:
- Ji bo ku ew xwe texe caven Jina xweş
Kalo xwe berdabii nava paşgotine:
- Te lepike deste wi ye cepe dit?
- Min ew ditş
- Hundure wi lepiki tije vazelin eş
- Vazelin? Ewji bo ci?
- Biner ez e ci bibejimşşş Curley dibeje ku ew dixwaze
wi deste xweji bo jina xwe nerm bigireş
George bi diqet kaxez di cav re derbas dikirinş
- Ma ne şerm e ku ew tişten wilo klret dibeje?
Kalo rehet biibiiş Wi dixwest ku George Curley
bieybineş Ji ber ku wi dizanibu edi ew pe li erde saxlem
dikeş he rehettir dipeyivi:
- Hela tu Jtna Curley bibineşşş
George disan kaxez şlkandin, bi fikir u hedi hedi
disan ew xistin doreş
- Ma ew xweşik e? pirsiş
- Ereş Xweşik eşşş Leşşş
George 11 kaxezan diniheriş
-Leci?
- Cik,şş Eiw pir difureşşş
- Na lo? E^ beri panzdeh rojan zewici yeş demek ew
he Ji difure? Nexwe dibe ku quretiya Curleyji we beş
- Min dit ku Jtna wi cav da Slimş Slim ew hevale ku
qantlran dicerineş A rasti ew lawikeki yeman eş Ji bo
ku Slim dl kare candlniye de bixebite hewcedariya wi

bl cizmen kabikbilid tune yeşMin dit ku Jlna wi cav da
Slimş Curley neditş Paşe min dit ku we cav berdane
34
Carlsonjiş
Mtrov digot qey hic deng nedicii Georgeş
- Gori ku dixuye we ew qeşmere han ji vir kem nebe?
Kaloji ser sindoqe rabu:
- Tu dizani ez ci dibejim?
George bersiv nedaş
- Ez dibejimş ev jina ku Curley Jl xwe re aniye rasterast
orospi yeş
- Eiv ne tişteld eceb eş bi sere gelek kesan ve hatiyeş
Kalo ber bl deri ve meşiya, kucike wi ye kal sere xwe
rakir ii li dora xwe niheriş Paşe Ji bo ku ew li dii
xwedtye xwe de bimeşeşew bi zore Ji cihe xwe rabiiş
- Wexti erebe werinş Ez herim sitilen serşuştune
dendmş Hun e ji ceh bar bikin?
-Ectş
- Tişten ku ez dibejim tu e Ji Curley re nebeji, ne
wilo?
- Ci munasebet?
- Tu careke we bibini bes e; tu e tavile fehm biki be ew
ci celebjin eş
Paşe ew derkete derve, ber roja sinciriş
George kaxez bi rek ii pek bi rez dikirinş Ji wan se
griip ce kirş Wi car sinek danine ser yeklibanş Sitavka
roje niha ronahiyeke carqorzi li erde anibu peş Gava
meş di nava ve sitavke de derbas dibunş mina ciruskan

dibiriqinş Ji der ve dengen xişexişa rişm ii alaven
hespe u ye ziqeziqa firenen erebeyen bargiran dihatş Ji
diir ve Ji denge qirineke hate bihistin:
- Seyis! Ho seyis!
Raşe:
- Min di dine vi reşiki hawha kiroş E^v cuye kijan ceheneme!
35
George li kaxezen vekiri temaşe dikirş Piştre wi kaxez
11 hev xistin ii li Lennie ziviriş Lennie wilo direjkiri liş
George diniheriş
- Bala xwe bide ş Lennieş kare me li re naceş Ye minş
caven min tirslyaneş Ez van celebmirovan nas dikimş
Wi meriki xwest ku ew te biceribineş Ji wi weye ku wi tu
cavtirsgmdi kiriyeşGer firsenda peşi tekeve desten wi,
ew e kulma xwe li ser caven te bixeş
Tirs dawerivibii caven Lennie, wi kir barin:
- Ez naxwazim sere min tekeve belaye, Georgeş Haya
teje hebeş ew li min nexeş ha?
George rabiiş cii li ser nivine Lennle runiştş
- Ez hic Ji xayinen wilo hez nakimş Min kesen wilo
pir ditlneş Kalo ji gotş ne hewce ye ku mirov Ji Curley
bitirseş Ye ku bi ser dikeve her tim ew eş
Ew biske fikiriş
- Ger ew bela xwe li te bide, ew e tavile me Ji vir biqewlrininş
Tu caven xwe baş vekeş Lennieş ew lawe
patron eş Guh bide minş Lennie, Ji bo Xwede tu neziki wi
mebeş ii qet bi wi re nepeyiveş Ger ew were vir, tu here
quncikeke din ya odeş Tu e guh bidi gotinen min, ne

wllo Lennie?
Lennle di ber xwe de peyivi:
- Ez naxwazim sere xwe texim belayeş Ma min ci bi
wi kiriye?
- Ger Curley bixwaze bi boksan were ser te, te tiştek
kiribe nekiribe, ne xem eş Tu qet neziki wi mebeş Tu e
ve di hlşe xwe de biheli ne wilo?
Denge erebeyen ceh zedetir dibunş Hengameya
nalen giran yen li ser erda hişk, ziqeziqa firenan ii
xlşexişa dengen rişmen zinciri dihate bihistinş Peyan
Ji erebeyem bangi hevdu diklrinş George 11 ser nivine
36
Lennle runiştibii ii kiir kiir difikiriş
Lennie bi rewşke şermoki pirsi:
- Tu hers nebii, ne wilo George?
- Ez Ji te hers nebumeş Ezji wi bebexte Curley hers
biimeş Min digot belki em bi hev re hinek pereşşş Qet
nebe min hevi dikir ku em e bi kemani sed dollari
bidine ser hevş
Bi awayeki qutbirin:
- Tu hic neziki wi mebe, Lennieş gotş
- Na, George, ez neziki wi nabimş Ez deve xwe ji venakimş
- Mehele ku ew firsend bibine ii bela xwe li te bideşşş
Le, ger ew lawe qehpe li te xeş tu e Ji dersa wi bidiyeş
- Ez e dersa ci bidimeş George?
- Ne tiştekş ne tiştekş Dema ew were ez e Ji te re
bibejimş Tebata min qet li hember van celebmirovan
tune yeş Li min guhdari bike Lennieş ger tiştek were

sere te, te e ci bikira, te bira te ne wilo?
Lennie rii bi fikir xwe da ser enişken xwe ii caven
xwe yen bi nerinen xemgin ber bi George ve zivirandinş
- Ger tiştek be sere min tu e destur nedi ku ez li
kiroşkan binerimş
- Min nexwest ez we bibejimş Te bira te em do li ku
razan, ne wilo? Li keleka wi ceme haş
- Ere, te bira minş Ji xwe te bira minş Ez e herim wir
ii xwe di nava deviyan de veşerimş
- Heya ku ez werim te bibinlmş tu e li wir veşirti
biminiş Tu xwe nişemi kesi medeş Tu xwe 11 keleka cem,
dl nava deviyan de veşereş Ka disa bejeş tu e ci biki?
- Ez e 11 rex cem xwe di nava deviycm de veşerimş
- Ger tiştek were sere teş
- Ger Uştek were sere minş
37
Li derve denge xlzina fireneld hatş Yeki Ji bang klr:
- Seyis! Ho seyis!
George:
- Ji bo ku tu Ji bir nekiş di dile xwe de ducare bikeş
gotş
Gava ew şewqa carqorzi ya li erde bii siş herdiwan Ji
sere xwe bilind kirinş Di deri de Jineke ciwan xuya kirş
Leven we yen qalind ii boyaxkiri u caven we yen geleki
ji hev diir u makyajkiri hebiinş Neyniiken we sor biinş
Pore we titik titiki li ba dibuş Kinceki Ji pembo ye
navmale le bu u şimikeke bi periken heştirme xemalandi
di lingen we de biinş

George bere xwe Je guhertş paşe disan le niheriş
- Beri niha bi deqiqeyeke ew b vir biiş paşe cuş
-Ha!
Ji bo ku jlnik he Ji singa xwe vekeş we deste xwe bire pişt xwe ii xwe sparte deri:
- Yen ku nu hatineş hun in?
-Ereş
Lennie Jlnik bi diqet di cav re derbas kirş Digel ku mirov digot qey haya jinike ji Lennie tune ye Jiş we disan laşe xwe bi sivikahi 11 ba dikirş Paşe li neyniiken xwe niheri ii bi awazeki bi hincet:
- Curley carina dihate virş gotş
Geoige hers bii:
- Ez ci biklmş ew ne b vir eş
Jinike ji bi nerineke beedeb:
- We caxe ez eji herim le bigerimş
Lennie mina ku deve wi hatibe giredanş li Jinike dlnlheriş Jl George re got:
- Ger ez wi bibinlmş ez e Je re bejim ku tu 11 wi digereş gotş
38
Jinik bi xasukti bişiri ii kulimeken xwe hejandinş
- Legerina li yeki ne şerm e yaş gotş
Ji aliye deri ve denge Slim hate bihistinş
- Rojbaş kecika dilberş
- Ez li Curley digerimş Slimş
- Xuyaye tu qet le nageriş Min niha ew dit, ew dicii maleş

Jinik bi ceireke ve veciniqiş Ber bi ode ve cu:
- Bi xatire we zarokno! we bi dengeki bilind got ii bi xurti ji wir bi diir ketş
George li Lennie niheriş
- Lawoş ev ci delik eş yaho! gotş Curley Ji Jin neditş geriya geriya hema ev dit!
Ji bo ku Lennie wi bipareze:
- Jinik xweşik eş gotş
- A xweşikbune xweşik eş Ji xwe ew ji venaşereş We Curley plr Ji desten ve bikişineş Lawo bi şeref mirov dikare ve jinike bi bist dollari bine ser reş
Lennie he ji li deriye ku Jinikje derketibu, dineriş
- Tişteki xweş biiş ha'
Ew bi heyrani dibişiriş George cavek avete wi, paşe bi guhe wi girt ii ba daş Bi hers:
- Li min binihere dahbeş niherina 11 ve orospiye qedexe yeş Ji min re ci, ci dibeje bila bibeje, ci dike bila bikeş ne xema min eş Min maren wilo pir ditineş Even ha ji bo ku mirov texin qulike pir Jir inş Tu tekili we mebeş
Lennie hewl dida ku guhe xwe xelas bikeş
- Min tiştek nekiriyeş Georgeş
-Ji xwe te tiştek nekiriye, le biska din, gavajinike cimen xwe nişan didanş te caven xwe je nediqetandinş
- Xerabiyek di hişe min de derbas nebuyeş Georgeş bl 39
namusşşş
- Xem nakeş le tu neziki we Jine mebeş te fehm kir!

An na tu e tekevi xeftke, bihele bila Curley tekeviyeş
Bila wi ev Jin neanibaş
Bi kerihandin got:
- Lepike bi vazelinş Ji sedi sed ew her roj heka xav
dadiqurtine ii Ji dermanxanan ji dermane qewete
dikireş
Lennie bi careke ve qiriya:
- Ev der li xweşa min necuş Georgeş Vir ciheki pis eş
Ez dtxwazim Ji vir herimş
- Ta ku em cend qumşan bidin ser hev dive em li vir
bimininş Tu cara we tune yeş Lennieş Ger ftrsend tekeve
desten me em e herinş Ez Ji ne dildare vi cihe pis e kiret
im
E^v disgm cii ser mase ii kaxez vekirinş
- Min qet ji vir hez nekirş gotş şeytan dehfan dide
mln iiji min re dibejeş bide re ii hereş
Hema ku em bikaribln hinek pere bi dest bixin, heta
Amerikan River hebe em e derkevinş em e herin zeran
bişonş Em e bikaribin li wir roje du-se dollaran qezenc
bikinş Ki dizaneş dibe ku em rehezeran Ji bibininş
Lennie bi xemgini xwe bi ser wa ve tewand:
- Em herin, Georgeş Em Ji vir herinş Ev der ciheki pis
e
Pişti ku wi şehkirina pore xwe qedand, bi
revecuneke celengi ku ancax kesen esilzade u hunermenden
hoste dikarin bhneşinş kete odeş Ew erebevan
bu, le weke qirale clftlike buş Wi bi rişmeke, dikaribu
bi careke ve şanzdeh qantirş heta bist qantir biajotaş

Ger meşeke xwe li ser heta qantireki daniyaş bei ku ew
qamciye xwe bl qentir bikeş wi dikaribu ew meş
40
bikuştaş Di tevgeren wi de wisan sergirani ii bepejni
hebiiş gava ew dipeyivi her kes disekinin ii li wi
guhdari dikirinş Baweriya wi ya bi xwe ewqas xurt buş
te dive Ji politikaye an Ji Ji evine gotin vebiiyaş di her
mijare de tavile baweri bi gotinen wi dihatin aninş Ev
eş Sllme erebevan peyayeki wilo biiş Ji riiye wi ye teng ii
direj texminkirina temene wi beimkan buş Mirov
dikaribu ew si saliji nişan bida, penci saIiJişşşGuhen
wi Ji tişten ku dihatin gotin betir dibihistş pejrva wi
giranş ne ji ramaneş le nuceya ku Ji ramane Ji derbas
dlkirş didaş Desten wi yen mezin ii zirav mina desten
danskeran yen piroz bi badan tevdigeriyanş
Wi şewqe xwe ye ku pelixi bu rast kir ii da sere xweş Li
herdu peyayen li hundur baş niheriş
Bi naziki:
- Li derve roj wilo germ biiş ku caven minji bere venedibiinş
wi gotş Ez hundur nabinimş Yen ku nu hatine
hiin m?
- Em niha hatinş Goerge gotş
- Ma hiin e di kare rakirina ceh de bixebitin?
- Patron wilo gotiyeş
Sllm li aliye mase ye dinş li hemberi George, li ser
sindoqe runişt ii bala xwe da kaxezen li ber xwe
rezkiriş - Xwede bike ku we bidin ba minş gotş
Denge wi geleki şerin biiş

- Li ba me du gejiken qelew heneş ew nikarin
cewalen ceh ii genim ji hev veqetininş Ma we qet kare
rakirina ceh kiriye?
- Ereş me klriyeş George gotş Ye min marifeteke min
ya wllo ku bibe destan ii tekeve devem tune yeş le ev
hiite ham, bawer bike baren ku ew hildigire tu kes
nlkare hilgireş
41
Lennie guhen xwe bel kiribiin ii li wan guhdari dikir,
gava wi ew pesne ha bthist, bi kefxweşi keniyaş Slim ji
iltifata George bi nerineke rast ditş Wi xwe bi ser mase
ve tewand ii kuje kaxezeke kevin le şikandş
- Hiin bi hev re digerin?
Geoige:
- Ere, got, em weke du miroven ku hevdu temam
dikin inş
Bi tiliya xwe ya nişane Lennie nişein da:
- Ne pir biaqil e, le gava were ser kar, caven wi natirsinş
Ew xorteki yeman e, le ne hewqas biaqil eş Ez wi
gelekiji kevin de nas dikimş
Slim caven xwe bera George danş bi ftklr:
- Mirov II kesen ku plr bi hev re dlgerin rast nayeş Ez
nizanim be Ji ci yeş Dibe Ji ji ber ku mirov 11 ve cihana
pis Ji hev ditirstnş
Geoige:
- Gava mlrov bi yeki nas re digere xweştlr e, gotş
Peyaki xurt e bi navmil kete hundurş Ji ava ku Ji
sere wi diniquti xuyabii ku wi nii sere xwe şuştibiiş

- Ho Slimş gotş piştre sekiniş caven xwe li ser George
u Lennie gerandinş
Slim bi awazeki peşkeşklrini:
- E^v niha hatinş gotş
Peyaye girs:
- Bi xer hatineş gotş Nave min Carlson eş
- Nave min Geoige Miltonş ye viji Lermie Small eş
Carlson:
- Blciik ha, goL E^v qet Ji 11 biciikan neciiyeş
- Qet Ji ne biciik e, wi dubare kirş
Bi we heneka han bl pirqini keniyaş
- Slim, min e ci bigotaşşş Delika te 11 ku ye? Ew ve
42
slbehe ne 11 bine erebe buş
Slim:
- Ew do evari za, gotş We tam neh cewTik aninş Min
car heb Ji wan tavile di ave de xeniqandin ş Lewra ew
nikgire ewqas cewrik xwedi bikeş
- Demek hej penc heben din Ji hene?
- Ere, penc heben din ji heneş Min ya heri glrs veqetandiyeş
- Gelo ewji kijan tixmi ne?
- Ez nizEmim, Slim gotş Hebe tune be ew e bibin
kficike şivananş Gava delika me har biibii, tu tixmen
kucikan en din 11 vir tunebiinş
Ceirlson dom kir:
- Demek penc cewriken te heneş Ma tu e hemiiyan
xwedi blki?
- Ez nizanimş Ji bo ku ew cicike Lulu bimejin, dive

ew demeke li vir biminiş
Carlson bl fiklr:
- Tu zane Slim, le tiştek hate hişe min, kucike
Candy ye bi musibet ewqas pir biiye ku nikare di bine
xwe de bimeşeş Di ser re Ji bina geni je teş Ew kengi
tekeve ode, du-se rojan behna wi Ji poze min demakeveş
Cima tu Ji Candy re nabeje da ew kiicike xwe ye
beker bikuje ii Ji xwe re cewrikeki te mezin bikeş Gava
ew kiicik neziki min dibe, Ji behna wi sere min gej dibeş
Di deve wi de diran nemane, caven wi nabinin, nikare
xwarina xwe biserifineş Ew nikane tişteki din biciiş
Candy wn bi şir xwedi dikeş
George caven xwe Ji Slim venedlqetandinş
Ji nişke ve 11 zengileki ketş Zengile ku bere hedi hedi
dest pe kiribii, paşe bi lez bu ii dawrtye bii mina dengekiş
Carlson:
43
- Zengil ledikeve, gotş
Dengen peyayen ku di ber deri re dicun ii dihatin
hate blhistinş Slim hedi hedi rabuş
- Heyde zarokno, beri ku xwarin xelas bibe em xwe
bigihinineş Pişti du deqiqeyen din zemix namineş
Carlsonji Slim re re vekir, paşe herduji derketin ii
cunş
Lennieye ku bi heyecan bu 11 George dineriş George
kaxez Ji hev belav kirinş
- Meraq meke, tişten ku te gotin min bihistin,
Lennieş Ezji wan cewrikeki dtxwazimş

Lennieye ku Ji xwe ciibii:
- Le bila spi ii qehweyi be, bi qerin gotş
- Heyde em herin xwarineş ez nizanim be spi ii qehweyiye
wi hene an naş
Lennie Ji nava nivine xwe tevnediliviyaş
- Niha Ji wi bipirseş Georgeş Bila ew yen din Ji
nekujeş
- Baş eş heyde wereş rabe ser xweş
Lennie mina ku ji ser nivine xwe ginder bibeş rabii
ser xwe u bi hev re heya ber deri meşiyanş Ew tam wexti
bigihiştina ber deriş Curley mina biriiske kete hundurş
Bi dengeki bi hers Ji wan pirsi:
- We h van deran tu jin nedittye?
George bi dengeki sar :
- Beri niha bi nivsaeteke me Jinek ditş gotş
- Li vir ci gu belav dikir?
George bei ku tevbilive li xorte hersbiiyi temaşe klrş
Bi dengeki ku wi herstir bike, got:
- We got ku ew 11 te digereş
Mirov digot qey Curley ceira peşi George dibineş Bi
cavsori 11 George diniheri, di hişe xwe de ew piva, wezi-
44
nand, gewde wi ye xurt di cav re derbas kir, dawi pirsi:
- E^v bi kijan hele ve cii?
- Ezji ku dizanim be ew bi kijan hele ve cu? Min Ji
paş ve le neniheri kuş
Curley bi dijminahi li wi niheri, ziviri, Ji deri
deriiet ii cuş

George Ji Lennie re got:
- Tu dizani Lennie, ditirsim ku rojeke ez tişteki
binim sere vi serseriyiş Ci ruyeki wi e pis heyeş Tu bi
Xwede ki heyde bimeşe, an na em e deven xwe 11 hewa
vegirinş
E^v derketinş Rqj edi di bine pencere de bi qasi xeteke
mabiiş Ji diir ve denge tacik u beroşan dihatş
Pişti kurtedemeke kucike kulek di deriye vekiri re
kete hundurş Bi caven xwe yen bi xumam li der ii dora
xwe niheriş Wi der ii dor behn kir ii sere xwe dani ser
pepiken xwe yen peşiş Curley careke din ji di deri de
xuya bii ii li ode niheriş Kiicik sere xwe bilind kir, le
bele gava Curley bi careke ve cu, sere kiicik ye kever
disan bi ser lingen wi ve ketş
45
Digel ku ronahiya evare dl penceran re dibiriqi ji, le
hundur tari biiş Ji deriye vekiri denge listikeke nalan
ii car caran denge cinginiya hesin dihatş Hin caran Ji
denge pesindayin ii lidijderketine bilind dibiiş
Slhn u George bi hev re ketin odeya tariş Slim deste
xwe di ser maseya listike re direji lampeya ku bi
abajiireke tenekeyi hatibu nuxumandin kir ii ew
pexistş Ser mase tavile rohni buş Ji ber ku abajure şewq
rasterast dida mase, quncika ode disan tari maş Slim
li ser sindoqeke riiniştş George Ji derbasi peşbere wi biiş
- Cane min, ew ne heja ye ku mirov behs Ji bike,
Slim gotş Cawa be hina divabii min neviye din Ji
blkuştaş Tişte ku bete spaskirin ci ye?

George:
- Dibe ku Ji bo te beqimet beş le mina ku te dinyayek
dabe wiş Ez di dine we kim, ew e ntha ne hesan be, ku
em lewik li vir binivininş Ew e bixwaze ku bi kiicikan
re II exur razeşşş Ew e zehmet beş ku em bikaribin Ji bo
ku ew di nava cewrikcm de ranezeş bibine astengş
- Cane minş ma gotlna we te kirinş disan Slim gotş
- Te ditş tişten ku te ji bo we yeke gotin geleki rast inş
Dibe ku ew ne biaqil beş le gava were ser karş min heya
46
niha yeki mina wi neditiyeş Tu nemabu, ku wi lawike
ku bi wi re kar dikir bikuştaş Kes nikare bi wi re qayişe
bikişineş Min di Jiyana xwe de peyayeki wilo bi hez
neditiyeş
Bin cengen George nepixinş
- Tu kare Lennie Je re beje ew e tavile bikeş tene bila
bi eqil re tekiliya we tune beş E^v Ji xwe ber II tişteki nafikire,
le tişte ku tu Je re bibeji ew e bike, Ji we re qet
gotin tune yeş
Denge cinginiya nale ku li singeki hesini diket ii
denge qirina pesindayineke, du pesindayinan hate
bihistinş
Ji bo ku şewq nede riiye Slim, ew hebeki bi paş de
vekişiyaş
- A rasti eceb e ku hiin wilo bi hev re digerinş gotş
Slim bi we yeke dtxwest ku hundure xwe Ji wi re
vekeş
George bi parastini:

-Tişte eceb di ve de ci ye? pirsiş
- Wele ez nizanimş Ji ber ku ez 11 miroven ku wilo bi hev re digerin rast nehatimeş Ma tu dizani karkeren rojane cawa dijin? Ew tenş cihen ku ew e le reizen nişani wam didin, ew meheke dixebitinş paşe uf dibin ii bi sere xwe radibin diheirinşşş Ew bi kesi re hevaltiya nezik damayninş Loma hevaltiya yeki mina vi diniki u yeki mina te cawekiri bi min eceb teş
George:
- Naş ew ne dehn eş gotş Ez Ji ehmeqiya vd re tişteki nabejimş le ew ne dehn eş Ez ji ne ewqas cawekiri me, an na min e bi tene Ji bo terkirina zike xwe Ji xelke re ceh nekişandaş Ger ez cawekiri buma, em Ji ez hebeki jir biimaş we erde min bi xwe hebiiyaş Ji berdela ku min
47
e derde behna deve xelke btkişandaş min e erde xwe biajota ii bendera xwe rakiraş
George bedeng maş Ji dile wi dihat ku ew bipejriveş Slim ne ew teşwiq dikirş ne Ji kefa wi le dişikandş Bi awayeki bedeng ii guhdar riiniştibiiş
Dawa dawi George got:
- Tişteki wilo eceb di gera me ya bi hev re tune yeşEm herdu Ji li Auburne hatine dineş Min xaltiya wi Clara nas dikirş Lennie he zarokeki şirmij bii xaltiya wi ew girt ba xwe u ew mezin kirş Gava xaltiya wi Clara mirş Lennie bi min re hate karş Pişti demeke Ji em hini hevdu biinş
Slim:

- Hiiş gotş
George li Slim niheri u caven wi yen mina yen Xwedayeki
beqeyd ditinş
Geoige:
- Ekieb eşgotş Min bere hertim heneke xwe bi wi dikirş
Ji ber ku bi qasi ku ew nikaribe Ji nav derkeve ew gejik
bu, min texliten listikan pe dikirinş Le bi qasi ku nizanibe
bi wi listik tete kirinş ehmeq biiş Wi ez hindiki nekenandimeş
Min li ba wi xwe mina miroveki qumaz
diditş Min ci bigota wi tavile diklrş Min Je re bigota xwe
Ji ciheki bavejeş bei ku ew bifikire wi e xwe biavetaş
Pişti demeke edi hew kene min bi ve yaka han hatş Ew
qet hers nedibuş Min ne hindlki li wi xistiyeş Ger wi bi
herdu desten xwe a ha wilo ez bigirtima we parsuyen
min di hev re derbas bikirinaş Le bele wi tiliya xwe ya
qeraqiicke Ji li min hllnedaş
Georgehejivebii:
- Biner, be min Ji bo ci devji vcm henekpekirinan
berdayeş Rojeke neh-deh kes 11 ber ceme Sacramentoye
48
civiyabiinş Hingi ji dile min hat ku ez listikeke
bikimşşş Ez li Lennie zivirim ii min gote:" Xwe baveje"ş
Lennie xwe avete cemş Wi bi avjeniji nizanibiiş Hlndik
mabu ku ew bixeniqiyaş Ji ber ku min xwe avetibii ave
ii ew xelas kiribii, ew wexti bibiiya erd ii koletiya min
bikiraş WIJi bir kiribii ku min Je re gotibu, xwe biaveje
aveş Le Ji we hinge pe ve edi min hew heneken wilo bi wi
kirinş

- Lawikeki pir baş eş Slim gotş Ji bo ku yek bibe mirov ne pewist e ku ew pir biaqil beş Hetaji min re wilo te ku carina berevajiya we dibeş Bi rasti kem caran Ji kesekijir ii qumaz miroveki qenc derdikeveş George careke din ew kaxezen ku li ser mase belavbuyi biin dan hevş Li derve nalan digotin tep u 11 erde diketinş şewqa evare he ji pencere rohni diklrinş
George:
- Ji famila min tu kes tuneyeş gotş Min yen ku bi tena sere xwe Ji bo kar ciine ciftlikan ş ditinş Tişteki betam eş Ew Ji Jiyane zewqe nastininş Ew dawi dawi dibine miroven xerabş Cane wan bi kerb dibeş
- Rast e, ew dibin miroven xerabş Slim Ji ew heqdar derxistş Ew dikevin rewşeke wilo ku hew dixwazin bi kesi re du gotinan bikinş
George:
- pire caran Lennie Ji dibe bareki ku nayete kişandinş Le gava mirov hini gera bi hevaleki re dibeş paşe mirov nikane dest Je berdeş
Slim:
- Qet ne lawikeki xerab eş gotş di nerina peşi de xuya dibeş ku Lennle ne lawikeki xerab eşşş
- Ji xwe ew ne xerab eş Le Ji ber ehmeqiya xwe tuni ew sere xwe dixe belayeş Wi li Weede Ji wrilo kiribiiş ş
49
Gava wi kaxezek nivi zivirandş ew sekmiş Mina ku ew biveciniqe wi cavek avete Slimş
- Tu e Ji kesi re nebejiş ne wilo?

Slimş bedeng bedeng:
- Wi 11 Weede ci kir?
- Tu Ji kesi re nabejiş ne wilo?şşş Ez emin im ku tu
nabejiş
Slim disan pirsi:
- Ma wi h Weede ci kir?
- Ma ew e ci bikeş wi şengeke kirassor ditş Min Ji te re
got yaş aqile ye me hebeki kem eş ger tiştek li xweşa wi
here ew e muheqeq deste xwe di ser re bibeş E^v tene dixwaze
deste xwe di ser re bibe il hewş Gava wi deste xwe
direj kirş da deste xwe bi klrase we ye sor bike, Jinik
qirlyaş Lennieye me şaş bii, nizanibii we ci bikira,
hema bi kurtekirase jinike girtş Jinik Ji her diqiriyaş
Ez ne diiri wan bum, qirina Jinike dihate minş min
tavile xwe gihande ba wanş Lermie wilo tirsiyabii ku wi
Jl hişk bi girtina kirase Jinike pe ve tu tişt nedikirş
Hema min dareke sence rakir ii pe 11 sere wi xistş da ew
kirase Jinike zu berdeş Ew wilo tirsiyabu kuş te ci
biklra ji wi kirase Jinike bemedidaş Paşe tu zane, ew bi
ci bigire, diqumfineş
Slim bei ku miiyeki wi tevbilive li peşiya xwe
dinlheriş Hedi sere xwe hejandş
- Baş eş paşe cilo bii?
George bi diqetji kaxezan destaki din rez kirş şş
- We ci bibeş jinik hema baz dide polisxane ii dibejeş
eve ha dest avetiye minş U xorten Weede Ji bo ku Lennie
linc bikinş 11 der ii dore belav biinş Em mecbiir man ku
em hemii roje di kortaleke ave de li ser congan riinenş

Tene seren me bi ser ave diketinş bi xera gihayen li
50
dora kortale em xelas biinş Me we şeve kefen cirandş
Slim demeke tiştek negotş paşe:
- Demek wi dest li we Jinike nedabu?
- Na camerş Tene zirave we qetandibii u hewş Ger ew
deste xwe baveje min ez e Ji bitirsimş Le wi tiştek bi
kecike nekirş Bi tene wi dixwest kirase we ye sor mist
bideş eyni mina ku ew her celeka ku dibine mist dideş
- Ne lawikeki xerab eş Slim gotş Ez peyayen xerab ji
caven wan nas dikimş
- Wilo yeş hem Ji ez ci bibejim ew e tavileşşş Lennie di
deri re kete hundurş Wi cakete xwe ye şin avetibu nava
mile xwe ii bi şewişin dimeştyaş
George:
- Eeeş de ka bejeş Lennieş got, te Ji cewrike xwe hez
kir?
Lennie bi nerineke xemgini:
- Ye spi ii qehweyi, gotş Tam weke ku min dixwestş
George bi tevgereke qutbir devji kaxezan berdaş bi
dengeki sar:
- Lennie! gotş
-Ciye?
- Min Ji te re negotibii cewrike xwe neyne vir?
- Cewrike ci? Bi min re cewrik mewrik tune yeş
George hema ber bi wi ve baz daş bi mile wi girt ii ew
11 ser pişte ramedandş Paşe George deste xwe direj kir u
ew cewrike ku Lermie di paşila xwe de veşartibuş derxistş

Lennie bi hilperineke rabii ser xwe:
- Ka wa bide minş Geoigeş
GcoTge:
- Dive tu tavile rabi vi cewriki bibi texi sindoqa wiş
gotş Dive ew li ba diya xwe bimineş Qey niyeta te heye
51
ku tu wi bikuji? Cewrike ku he do evari cebiiyeş tu dici
Ji sindoqa wi derdixiş Baz de wi bibe cihe wiş an na ez e
Ji Slim re bibejimş da ew cewrik Ji te bistineş
Lennie bi bergerin desten xwe direji wi kirin:
- Ka cewrik bide minş Georgeş ez e wi bibime cihe wiş
Min nedixwest ez tişteki xerab pe biklmş Georgeş bi
namiis min dixwest tene ez wi hebeki mist bidimş
George cewrik da waş
- Baş eş baz deş tavile wi bibe texe cihe wi u careke din
Ji wi Ji sindoqe dernexeş An na tu dizani ku ew e
bimireş
Lennie qeliziş Sllm Ji cihe xwe tevneliviyaş Wi bi
caven xwe yen sakin derketina Lennie temaşe kirş
- Ew eyni mina zarokeki penc sali yeş ne wilo?
- Ereş ew mina zaroka yeş Hem Ji mina zaroken saf
eş Ew e here li exur li ber sindoqe razeş Eh, guh
mediyeşşş Ew ci dixwaze bila bikeş Li wir xerabiya wi
nagihije kesiş
Edi baş tari biibiiş Xulame kal Candey kete hundur ii
cil 11 ser nivine xwe runiştş Kiicike wi ye kal ji bi zore 11
dii wi dimeşiyaş
- Merheba Slimş merheba Georgeş Ma hiin neciin

listika nalan?
Slim:
- Listina herşev 11 xweşa mln naceş
Candy dom kir
- Ji bo Xwede dilopeke whisky 11 ba ke heye? Zike
mln dieşeş
Sltm:
- Li ba min tuneyeş gotş Zike min naeşeş le ger
whisky hebiiya mln e Ji vexwaraş
Candy:
52
- Zike min pir dieşeş gotş Hemii Ji ruye wem silqan eş He
beri ku ez bixwimş ez dizanim ew e ci were sere minş
Ceirlsone qelew Ji hewşa tari ve kete hundur, derbasi
aliye din ye ode bu u ew lampa din ya bi abajiir pexistş
- Lawo li vir cav cavan nabineş Ez di dine we kimş ev
e reşik wilo nalan daveje kuş
Slim:
-Bi rasti Ji ew Jehati yeş gotş
- Tu ci dibeji camer! E^v nahele kes caven xwe vekeşşş
Ew sekini u behn kirş Gava wi behn kirş wi bere xwe
da aliye kucikş
- Wey li minş ci behneke vi kiiciki a ne xweş heye! Vi
baveje der Candyş Ev kuciken pir ciqasi behn didinş
Heydeş vi derexeş Candy bi zivirandin hate qiraxa
nivine xwe ii uzra xwe xwest:
- Ev Ji mej ve ye ku H ba min eş edi ez bi behna wi nahesimş
Carlson:

- Baş eş le ez ji behna wi gej dibimş Ger ew Ji vir derkeve
Ji de behna wi 11 hundur bimineş
Ew bi gaven giran neziki kiicik bii u le niheriş
- Diran di deve wi de nememeş E^ nikare li ser xwe Ji
bisekineş Ci feda vi kiicike pir digihije te Candy? Feda
wi nagihije wi bi xwe jiş Cima tu vi heywemi nakuji ?
- Bi Xwede!şşş E^^Ji mej ve ye li ba min eş Min ew he Ji
biciikti ve xwedi kiriyeş Ez bi wi re 11 bendi mihan
mameş Hiin li ve rewşa wi diniherin ii bawer nakinş le
ez di Jiyana xwe de li kucikeki şivanzm ye mina vi rast
nehatimeş şşş
George got:
- Min 11 Weede peyayek nas dlkirş kiicikeki wi ye
şivanem hebuş ew marifeta xwe Ji kiiciken din hin
53
bubiiş
Carlsonji tişte ku dizanibii qet şaş nedibii:
- Bala xwe bide min Candyş gotş Ev kiicike hcm her
jane dikişineş Tu e wi bibi ii guleyeke berdi a vir widaqiil
bii u ew cih nişan da-ew qet ferq Ji nakeş
Candy bl caven xemgin li dora xwe niheri ii hedika:
- Naş naş gotş Ji desten min nayeş Ew Ji zu ve ye ku li
ba min eş
Carlson israr kir:
- Jiyan ji vi heywani re dibe ezabş Di ser de Ji ew
mina daşire behn dideş Ez ji te re tişteki bibejim? Ez
dikarim Ji berdela te ve wi bikujimş da ku tu pe neeşiş
Candy cimen xwe Ji ser yeine berdan Jerş Riha xwe ya

spi bi hers mist da u bi hedika:
- Ez wllo hini wi biime ku, gotş Min ew Ji biciikti ve
mezin kiriyeş
Carlson:
- Jiyandina wi naye maneya ku tu qenciye bi wi
diki, gotş Guh bide mlnş Delika Slim teliqiyeş Ger tu
bixwaziş we Slim cewrikeki bide te, tu dikari ji xwe re
mezin bikiş
Erebevan kiicike pir bi caven xwe yen sakin hin
klribuş
- Ereş gotş Ger tu bixwaziş tu dikari cewrikekiji wan
Ji xwe re bibiş
Bl careke ve mina ku ew li xwe mikur hat:
- Heqe Carl heyeş Candyş Fedeyeke vi kiiciki
nagihije wi bi xwe jiş Ger ez kal ii kulek bibimş ez e pir
bixwazim ku yek guleyeke berde minş
Ji ber ku gotlna Slhnjl hukme qaniine bilş Candy bi
caveki behevi li wi niheriş
- Belki cane rebeno bieşeş Xwedikirina wi Ji min re
54
ne zehmet eş
Carlson:
- Ez e wi bi usiil bikujimş Ew e tişteki his nekeş Ez e
silahe berdim tam vira wiş (Wi bi pozika sola xwe ew
cih nişan da)ş Ew e tavile can bideş
Carly her li riiyen wan dlnlheri ii mina ku
alikariyek dipa dixuyaş Karkereki ciftlike kete
hundurş Te digot qey wi bi milen xwe yen daketi barek

ceh hilgirtiyeş pe li poziken solen xwe dikir ii bi
şewişin dimeşiyaş Ew cu ber nivine xwe u şewqe xwe
dani ser refeş Paşe wi ji refe reihişte kovareke ii ami ber
şewqa ser maseş
- Slimş ma min ev nişani te dabii? pirsiş
- Te ci nişemi min dabii?
Ye xortş rupelen koveire yen dawi tev danş piştre
kovar dani ser mase ii bi desta işaret kirş
- Ka tu vir bixwineş
Slim xwe daqiil kirş
- Heydeş bi denge bilind bixwineş merik gotş
Midur beg hedi hedi dixwendş "Ev sere şeş mehan e
ku ez kovara we dixwinim u ez di we baweriye de me ku
kovara we ya heri baş eş Ciroken Peter Rand li xweşa
min dicinş Ew zilame han yeman eş Me Ji romanen
mina "Siware Hespe Reş" bepar nehelinş Ez ne miroveki
wilo me ku li ser hev naman dinivisimş Bi tene
min xwest ku ez Ji we re cend rezan binivisim ii bi we
bidim zanin ku kovcira we ya heri baş eş"
Slim bi nerineke pirsyzirki sere xwe bilind klrş
- Tu cima ve bi min didi xwendin?
Whitgot:
- Tu dom bikeş nave 11 bini bixwineş
Slim xwend:
55
- Di karen xwe de biserketi binş William Tennetş
Disan li Whit niheri:
- Min xwendş ci ye?

- Bill Tenne te bira te? Beri se mehan ew 11 vir dixebitiş
- Ma tu dibeji ku wi e ev nama han nivisandibe?
- Ereş wi bi xwe nivisandiyeş Whit bi dengeki bilind
gotş E^v eş
Slim:
- Herhal tu rast dibejiş Bi rasti wan nama wi cap
kirineş
- Ez emin imş Ez ii Bill rojeke li vir runişti biinş HeJmareke
kovare ku nii derketibu di desten wi de buş Wi le
diniheriş Ji min re got:"Min nameyek nivisandiyeş Ka
ez binerim be wan xistiye ve hejmareş Le wan nexistlbuyeş
Bill got: "Dibe ku paşe texine"ş A ev e ew
nameya wiş
George deste xwe direji kovare kirş
- Ka bide minş
Whit nivis ditş le kovar neda kesiş bi tiliya xwe ya
eşede name nişan daş Paşe wi cii ew kovar li ser refen
sindoqan bi rek ii pek bi cih kirş
- Gelo Blll ev diti ye? Ez ii Bill bi hev re li nava erde
nokan dixebitinş Me herdiwan Ji makineyen
percivandine bi kar taninş Bi rasti Bill lawikeki merd
buş Van peyven han kucike Carlson bi wi nedabu
Jibirkirinş Wi caven xwe Ji heywane pir nediqetandinş
Candy bi rewşeke aciz li wi diniheriş Dawi dawi
Carlson got:
- Ger tu bixwazi ez e a niha vi heywani Ji vi ezabi
xelas bikimş Em careke din Ji qala wi nakinş Ma ew
jiyaye ci ye? Ew nikane xwarine bicu, caven wi

56
nabinin, heta bei ku ew xwe bieşine nikare bimeşe Jiş
Cemdy hebeki bi hevi bu:
- Silaha te tune ye ku? gotş
-Ev c\ peyv eş Dememceke min a Luger heyeş Ew qet
wi naeşineş
Cancty got:
- Em e sibehe bifikirinş Ka bila sibeh beş
Carlson:
- Sedeme ku em e biminin sibehe ci ye? gotş
EXv cii ber nlvine xweş cente xwe Ji bine yane kişandş
Ji hundire cente demanceke bi marka Luger derxist ii
got:
- Em e tavile vi kari biqedininş Ma Ji ber ve behna
geni mirov dikare raze yaho?
Wi demance xiste berika xwe ya dawiş Bi heviya ku
ew e 11 dij derkeveş Candy demeke direj li Slim niheriş
Slim qet deve xwe venekirş Candye ku bi hevi bubiiş
hedika got:
- Başeş tu dixwazi ci biki? A Ji te re wi bibeş
Wi li kucik Ji neniheriş Xwe li ser nivine xwe direj
kirş desten xwe xistin bin sere xwe ii li zike ode niheriş
Carlson qayişeke biciikji berika xwe derxistş Paşe
daqul bii ii ew qayiş xiste stiiye kiicikş Ji bili Candy
hemuycm li wi diniherinş Bi hedika:
- Wereş kuciş kuciş gotş ti Ji bo teselikirine li Candy
zivlriş "Ew e qet his neke"ş
Candy tev negeriya ii qet bersiv Ji nedaş Carlson

qayiş badaş
- Heydeş bhneşeş
Kiicik bi hezar zehmetiyan rabii ser xwe, llngen xwe
di erde re klşkişandin ii qayişa ku ew dikişandş taqib
kirş
57
Slim:
- Carlson! gotş Tu dizani tu e cilo bikiş ne wilo?
- Tu dixwazi ci bibejiş Slim?
Slim bi kurtayi:
- Bereke bi xwe re bibeş gotş
- Ha, rast eş ez e bereke ji bi xwe re bibimş
Wi kucik di taritiye de derxist derveş
George heya deve deri bi wi re ciiş deri 11 dii wi girt ii
ristik kişandş Candye ku xwe li ser pişteş li ser nivine
xwe direj kiribuş li zike ode temaşe dikirş
Slim bi dengeki billnd got:
- Sime qantireke min ciriyayeş Ez e herim hinek
qetran te bidimş
Denge wi cu hemii kesen li odeş Paşe ew deket derveş
Derve bedeng buş Denge lingen Carlson hew dihatin
bihistinş Bedengiye ode dagirt u dom kirş
George got
- Bi namus niha Lennie he Ji bi cewrike kiicike re li
exur eş Niha ew xwedicewrik e yaş ew edi hew neziki vir
dibeş
SlimjiCanctyre:
- Tu cend cewrikan bixwaziş Ji xwe re bibe, gotş

Candy bersiv nedaş Ode disan di nava bedengiye de
maş Ew bedengi Ji taritiya şeve dihat ii 11 ode belav
dibuş George got:
- Gelo ma kes dixwaze bi min re bi desteyek kaxez
bileyize?
Whit
- Ez dikarim desteyeki dudan bi te re bileylzimş
Ew di bine lampe de li peşberi hevdu runiştinş
George kaxez li hevdu xistinş le Ji ber ku wi dengi bcda
hemii miroven 11 wir dikişandş wi dest Ji lihevxistina
58
kaxezan berdaş Ode disan di nava bedengiye de maş Bi
wi awayi deqiqeyek dudu derbas bunş Candy bei xwe
tevbilivine xwe li ser pişte direj kiribu ii 11 zike ode
temaşe dikirş Slim demeke le niheriş paşe li deste xwe
niheriş Wi desteki xwe dani ser deste din u wilo be
tevger hiştş Di we nave de di bine deri de dengeki sivik
hatş yen li we dere hemiyan bi dilşahi bere xwe bi aliye
deri ve kirinş Bi tene Candy caven xwe Ji zike ode nediqetandinş
George:
- Qey mişk di bine wi de heyeş gotş Dive em feqeke vegirinş
Whit debar nekir:
- Te pir dlrej kir lo! Cima tu kexezan nadi? Ma em e
bikaribin wilo bileyizin?
Pişti ku George destike kaxezan dani ser maseş li
riiye wan e pişte temaşe kirş Bedengiye careke din ode
dagirtibiiş
Ji diir ve denge silaheke hate bihistinş Peyayen 11

wlr caven xwe berdan ser kaloş Hemu seri ber bi wi ve
hatin zivirandinş
Kalo demeke temaşekirina xwe ya zike ode dom kirş
paşe hedi hedi ber bi diwer ve ziviri ii bedeng maş
George kaxez bi deng 11 hev xist u da wiş Whit texteki
Jimaran ber bi xwe ve kişcmd u fiş rast kirinş Piştre
Whit got:
- Qey hiin herdu bi rasti hatine kar?
Geoige:
- Tu dixwazi ci bibeji?
Whit keniya:
- Ji ber ku hiin roja ine hatine! Dive hiin du rojan bixebitinş
59
George:
- Ev hesabe ha nekete sere min, gotş
- Ger tu demeke direj li ciftliken weha mezin
mabiiyayi te e fehm bikiraş Peyayeki ku bixwaze li
ciftlikeke wilo cavneriyeke bikeş ew e roja şemiye pişti
nivro wereş Ew we roje xwarina xwe ya evare u roja
yekşeme Ji se dan xwarin dLxweş roja duşeme Ji pişti
taşteş bei ku deste xwe Ji tevbilivineş ereba xwe
dikişine ii diceş Helbiiki hun roja ine nivro hatine karş
Demek hesabe we ci dibe bila bibeş hindiktirin dive
hun roj u niveke betir bixebitinş
George II hundire caven wi niheri:
- Em e demeke li vir bimininş gotş Em bi niyet in ku
em cend qumşan bidine ser hevş
Deri hedika vebiiş sere seyis ye reşş bi ruyeki ku

xemginiyan şopen xwe II ser neqişandibun ii bi caven
bi hedanş direji hundur biiş
- Slim Beg!
Slime ku heji 11 Candye kal meze dikirş bere xwe da
wiş
- Ha! Ha! Merhebaş Crooksş Ci ye?
- Te xwestibu ku ez Ji bo sime hespe te qetrane
bikelinimşniha hazir eş
- Rast e Crooksş Ez e tavile herim dermen te bidimş
- Ger tu bixwazi ez dikarim bikimş Slim begş
- Na, ez e bi xwe btkimş
E^vrabiiş
Crooks rawestiyaş
- Bibejeş
- E^v peyaye girs hebii ya, ew e ku nu hatiyeş niha 11
exur e ii bi cewriken te dileyizeş
- Zergira wi nagihije wanş Min cewrikek Ji wan daye
60
Wlş
- Mln tene xwest ku haya te Je hebeş Ew cewrikanji
sindoqe derdixe ii wan di nava desten xwe de dieciqineş
Tişten wilo li xweşa rebenken hejwanan naceş
- Zerara wi nagihije wanş Slim gotş Ez e bi te re bemş
George sere xwe hildajore:
- Ger ew dehbe mezin kar xera bike, wi biqewirine,
Slimş
Slim bi seyls re derketş
George kaxez danş Whit ew kaxez girtin u di cav re

derbas kirinş
- Te Cuce dit?
-Cucaci?
-Jina Carly ya nii, loş
- Haş min ew ditş
- Ew xwe pir vekiri dihejineş
- Min ew wilo demeke direj neditiyeş George gotş
Whit bi tevgereke qure kaxezen di deste xwe de danin
ser mase:
- Hela tu hebeki din Ji 11 vir bimine u caven xwe
vekeş biner be tu e he ci bibiniş Jinik bi dizi nake kuş
Min heya niha tişteki wilo neditiyeş Kar ii işe we ew e
ku ew cav berde xelkeş Bi namiis we niha cav berdaye
seyis Jiş Armanca we ci ye ez tenagihijimş
Weke ku ne xema George be:
- Ji roja ku tu hatiyi vir qet şer demeketiye
pir vekiri xuya bu ku Whit guh nedida kaxezanş Wi
kaxezen di desten xwe de danin ser maseş
George kaxez bi desteki li hev xistinş Wi weke her
dem ew vekirinş Heft keixez bi rez kirin, şeş heb danin
ser, pencen din Ji danin ser wan ş
Whitgot:
61
- Ez fehm dikim be tu dixwazi ci bibejiş Naş he tiştek
nebuyeş Curly bei rawestem kecen xwe dikuştinş Kengi
xortek were virş Jinik hema xwe te dideş An ew e li
Curley bigereş an Ji qaşo mina ku we tişteki xwe winda
kiriye ii le digere, dikeş Bi kurti ew Ji pey xortan

naqeteş Curley Ji her kec dikevine, heya niha wi tu gu
Ji belav nekiriyeş
George got
Dawiya vi kari xerab eş Muheqeq we ji riiye ve
Jinike siqumatek cebibeş Ew tipeke wilo ye, Ji bo
mirov texe girtigehe amade yeş Kare Curley Ji zehmet e,
li ciftltke komek peya heneş cihen wilo ne li gori jinan
inş Ji xwe qet ne 11 gori yen wilo neş
Whit got:
- Ger te biveş tu Ji dikari sibehe evari bi me re weri
bajerş
- Cima? Ci heye?
- Weki her car em e herin mala Mama Suzyş A rasti
ew maleke yeman eş Mama Suzy her kesi bi ken li ser
pişte dixineşşş Ew behsa gelek tişten xweş dikeş şemiya
cuyi gava em cilbiine wir ii we em bera hundir dcm, li
keciken xwe ziviri ui got:" Kecikno, kincen xwe li xwe
bikinş komser hat!" Ew hic hovitiye Ji nakeş Pencjin li
ber desten we heneş
George pirsi:
- E^v kar bi ciqasi dibe mal?
- Bi du kaxez u niveş Li wir qedeheke whislQf bi bist ii
penc sentan eş Ji bo runiştine qoltixen xweşik Ji 11
mala Suzye heneş Ger cane mirov Jine nexwaze Jiş
mtrov dikare Ji xwe re li ser qoltixan runeş du-se qedeh
whisky vexwe u dema xwe derbas bikeş Qet ne xema
Suzye yeş ew ne dixweize mirov bilezineş ne Ji yen ku
62

Jinan naxwzin diqewlrineş
George:
- Belki ez ji werim wir bibinimş gotş
- Ji xwe ku tu weri tu e baş bikiş Em e li war tera xwe
kef bikinş Meima Suzyji me re gelek pekeninan dibeje,
em ji ber pekeninen we Ji kenan H ser pişte dikevin
xwareş Tu zane we rojeke ci Ji me re gote? Got:" Hin kes
hene gava ew xaliceyeke li erde radixin ii abajiireke bi
xeml bi ser ve bi dar de dikinş Ji wan weye ku ew kerxaneyeke
sosyete dixebitinin"ş We dev davete mala
Clarayeş Suzy got ku:" Ez dizanim be hun ci dixwazin
xortino!" Keciken min benexweşi neş Whiskya min Ji
av tekil nebuyeşYen ku bixwazin Ji xwe re li lampeyen
moriki biniherin u bi nexweşiya siizeneke bikevinş
cthe ku ew herine xuya ye"ş We paşe ji we got ku:" Ji ber
evina lampeyen morikiş ez ci peyayen ku xwe qure
dikinş nas dikim"ş
Geoi]ge:
- Demek Clara maleke din dişuxulineş ha?
- Ereş Wlilt gotş Em qet nacin wirş Mirov dikare bi se
dollaran ji fişekan baveje Clarayeş Ji bo qedeheke
whiskyji si ii penc sent; a din Ji ew nizane mina Mama
Suzye gotinen xweş bikeş Le mala Suzye pakij eş
qolttxen we Ji xweşik inş Le ew miroven cirmexweş
naxe hundirş
George:
- Ez ii Lennie dtxwazin hinek pere bidin ser hevş gotş
Dibe ku ez bi te re werim qedeheke vexwimş le ez du

dollar il nive xerc nakimş
- Mirov carina di nav re dlxwaze Ji xwe re kefe bikeş
Whit gotş
Deri vebii, Lennie ii Carlson bi hev re ketin hundirş
63
Ji bo ku Lennie li ber cavjm nekeveş ew cii li ser nivine
xwe riiniştş Carlson daqul bu ii cente xwe Ji bine
diwane derxistş Wi li Candye ku he Ji bere wn li diwer bii
ii direjkiri bu, neniheriş Carlson ji cente xwe firceyeke
biciik a bi taybeti ji bo pakkirina silahan bii ii şiişeke
zeyte derxistinş Wi ew danin ser nivina u rahişte
demcmca xweş gundorke we derxist u gulle Je avetinş
Paşe wi bi we flrceka bicuk lula we paqij kirş Gava
Candy denge ciqiniya enjektore bihistş ew ziviriş pişti
ku demeke li silahe niheriş disan bere xwe guhertş
Carlson hemaji xwe:
- Ma Carly he nehatlye? gotş
Whit
- Naş gotş Gelo Carly disan ci dide ii distine?
Carlson caveki xwe girtibu, li liila demanca xwe
diniheri:
- Ew li Jina xwe digereş Wi li derve her der tevlihev
kiriyeş
Whit bi awayeki henekpekirini:
- Ew nive wexta xwe bi legerina li Jina xwe derbas
dikeş nive dinjijina wi li wi digereş
Curty bi rewşeke teşqeleyi kete hundur:
- We jina min neditiyeş zarokno? gotş

Whit
- E^w nehatiye vir, gotş
Curly bi nerineke bi tehdit ode di cav re derbas kirş
- Slim bi ku de cehemi ye?
Geoige:
- E)w cuye exurş gotş Simeki hespe wi percivi yeş ciiye
qetrane te bideş
Curley milen xwe bi xwe ve berdan ii singa xwe nepixand:
64
- E)w Ji kengi ve ciiye?
- Beri neh-deh deqiqeyanş
Curly ber bi deri ve pekiya u bi gurmin deri li dii xwe
girtş
Whit rabii ser lingan:
- We ne xerab be, ku mirov li vi temaşe bikeş Her ku
dice Curly sere xwe winda dikeş Ne wilo biiya wi e nexwesta
ke ew bela xwe di Slim bideş Curly zirek eş pir
zirek eş Ew di bezina "Lepiken Zer" de ketiye finaleş
E^v, hemu rojnameyen ku behsa wi dikinş hiltineş
Ew fikiri:
- Le ger ew dest Slim nedeş ew e baş bikeş Slim noke
hesini yeş
Geoige:
- Ew wilo texmin dike ku Jina wi bi Slim re hawha
dike, ne wilo?
- Wilo dixuye, Whit gotş Le bele tu damustandineke
Slim bi jina wi re tune yeş Ez hic guman nakimş Le ger
ku kar cewd here, ez pir meraq dikim be we ci bibeş

Heyde em herin binerinş
George got:
- Ez e li vir biminimş Ez naxwazim poze xwe texim
nava karen wiloş Ez ii Lennie fikirine ku em peran
bidine ser hevş Carlson pakijiya demanca xwe qedand,
sileih xlste centeş cente Ji ajote bine yaneş
- Ka ez herim careke binerimş wi gotş
Candye kalji cihe xwe tevnediliviyaş Lennie Ji li ser
nivine xwe riiniştibii ii bi diqet II George meze dikirş
Pişti ku Whit ii Csirlson derketin u deri 11 dii wzm
hate girtinş George 11 Lennie zivlriş
- Tu ci difikiri?
- Hicş George, Slim dibeje, ger tu cend rojan cewrikan
65
mist nede ew e baş bibeş Slim dibeje, wilo zerar digihije
wanş Ez ji hema bi paş de hatim virş Min tişteki xerab
nekiriye, Georgeş
- Divtya bii mln evji te re bigota, George gotş
- Bi namiis mtn tişteki xerab bi wan nekiriyeş Min
cewrike xwe danibii ser mile xwe ii min ew mist dida,
tene ewqasş
George pirsi:
-Te Slim li exur nedit?
- Ere, min ew ditş Wi Jl min re got, ger tu ewqasi
cewrike xwe mist nedi tu e baş bikiş
-Te ew jlnika ha Ji nedit?
- Jina Curly?
- Ere, ma ew ne li exur bu?

- Naş Ger hatibe exur Ji min ew neditiyeş
- Ma te nedit ku Slhn bi we re pejrivi?
- Na, min neditlyeş Eiw nehadye exurş
George:
- Baş e, gotş Herhal ew e 11 pevciineke temaşe nekinş
Ger ew li hev bixin, tu tekili wan mebe, Lennieş
Lennie:
- Ez pevcime naxwazim, gotş
EXv ji nava nivine xwe rabii ii 11 ber mase, II hemberi
George riiniştş Bei ku George ferqa hebiina wi btke, wi
disan kaxezen xwe li hev xistin ii paşe veklrş Bi qesti,
bi hedikahiyeke bi sedem tevgeriyaş
Lennie deste xwe direj klr, rahlşt kaxezeke u di cav
re derbas kirş Paşe ew serberjer kir ii disan le niheriş
- A, herdu seriyen we mina hev Inş gotş George, Ji bo
ci herdu seriyen we mina hev In?
- Ez nizanim, George gotş Ew wllo cedlkinş Gava te
Slim li exur dit wn ci dtkir?
66
- Slim?
- Ereş te ew li exur ditibiiş wiji te re gotibii cewrikan
zede bi ser hev de neeciqine?
- Haş rast eş Di desten wi de kiizek ii firceyek hebiiş Ez
nizanim be wi e ci bikiraş
- Tu emin i ku Jinik Ji ne II wir bu? Te bira te, mina
ku ew sibehe zii hatibii virş
- Na, min ew 11 hundlr neditş
George behnek rehet berdaş

- Kuro ma qey kerxane nemane? Mirov li wir sere
xwe dibine ii tera xwe kef dikeş Li wir ne kes tekili te
dibe, ne Ji kes te dibineş Paşe tu dizane be ew e bi ciqasi
11 ser te bibe malş Le bele ger tu tekevi xefikeke wilo,
xelasi tune yeş
Lennie bi heyrani li wan gotinan guhdeiri dikir, Ji bo
ku ew sere gotine Ji bir neke, wi hedika deve xwe dibir ii
taniş
George dom kir
- Andy Cushman te bira te, Lennie? Ew dicii dibistana
destpekş
Lennieje pirsi:
- Ew e ku diya wi Ji zarokem re şerani cedikir?
- Ere, ewş Ger ew tişteki qirdiki be tavile te bira teş
George ew listika kaxeze ya ku vekiribiiş bi diqet
bercav dikirş Wi yeklibek dani ser reza peşi ii dulibş
selib u ccirllbeke ksiro Ji danine kelekeş
Geoiige:
- Andy niha di girtigehe de yeş Ew Ji riiye jina xwe
hatiye girtinş
Lennie bi tiliyen xwe li mase kire tiketikş
-Geoige!
-Ciye?
67
- Georgeş E^v mala ku em e mina maldaran te de
riinenşşş Paşe ji bo ku em kiroşkan Ji bikirinş Ji me re
he ciqas dem dive?
George:

- Ez nizanim, George gotş Peşi dive em peran bidine ser hevşşşEz ciheki biciikş ku mirov dikare bi peraki hindik bi dest bixeş nas dikimş Le ew be pere nadin mirovş
Candye kal hedika ziviriş Caven wi di nava sere wi de beloq biibun ii balkeşi 11 George guhdari dikirş Lennie;
- Ji min re behsa wir bikeş George gotş
- Min he doji te re behs kiribiiş
- Careke din Ji behs bikeş Georgeş
- Ev e Canoş penc hektar erde wi heyeş Aşeki wi ye biciik ye beş maleke biciik ii pinikeke wi heyeş Mitfaxeke wiş daren wi yen mewanş qeresiş sev u mişmişan heneş Daren gwizan ii hinek tiifiringiji heyeş Quncikeke wi ya ku wi le nefel candiye heye ii tera xwe Ji ava wi heyeş
- Le kiroşkş George?
- Niha kiroşk tune neş le ez e bi hesani cihek du cihen kiroşkan cebikimş Tu e Ji kiroşkan bi nefele xwedi bikiş
- Hem Ji ez e cawan xwedi biklmş
George desten xwe Ji kaxezan kişandş Denge wi he ji gurrbiiş
- We berazek du berazen me Ji cebibinş Em e mina kcdike mtnş ciheki karsaziye ava bikimş Em e berazan serjekin u Ji xwina wan sicuxan cebikinş U em e tibabek tişten din biktnş Paşe em e Ji cem neziki sed masiyem bigirin, wan xwe bikin u hişk biklnş Em e wan di

68
taşte de bi noşi bixwinş Ez 11 ser masiyen cem dehn
dibimş Em e di demsala feki de Ji wan konserve Ji
cebikin ş Cekirina konserveya ftringiygm hesan eş Em
e her rojen yekşeman mirişk anji kiroşkan serjekinş
Belki celekeke an bizineke me Ji cabibeş We şire we
ewqas tir be, ku mirov ancax bi kereş an Ji bi kevci bikaribe
toye we Ji ser reikeş
Caven Lennie beloq biibiin ii le guhdari dikirş
Candye kal ji caven xweji George nediqetandinş
Lennie bi hedika:
- Em e weke maldaran bijinş gotş
George:
- Ji xweş gotş We di bexceye me de komek sebze hebeş
Ger dile me bibije whisky an em e hekanş an şirş an ji
tişteki din biftroşin u Ji xwe re bikirinş A em e li wir
bijinş Ew der we bibe mala meş Ew e hewcedariya me Ji
ve gera berdewam ii Ji xwarina xwarinpejen Japoni
nemineşNa, naş em e bibin xwediye maleke ku ya me
beş Edi em e li nivingehe ranezenş
Lermie li ber wi geriya:
- Ci dibe, Georgeş Ji min re behsa male bikeş
- Ev eş we maleke me a biciik u heryeke odeyeke me
hebeş U we sobeke me ya girover Ji hebe; em e di zivistanan
de we pexininş Ji ber ku we erde me ne pir beş em e
wilo zede newestinş Belki em roje şeş-heft saetan bixebitinş
Em e roje yanzdeh saetan baren ceh nekişininş
Gava em tişteki bicininş em e bi xwe hilinin u em e bi

caven xwe bibinin ku tişten me ccmdiye we ci ber bidinş
Lennie bi germi got:
- We kiroşken me ji cebibinş Ez e li wan binerimş
Behs bike Georgeş ez e cawcm li wan binerim?
69
- Tu e raheji cewaleki ii heri nava erde binefeleş Tu e
cewel tiji nefel biki ii bibi texi pina kiroşkcmş
Lermle:
- E^v e bi qirceqirc bixwinş gotş Tu dizani ku ew
cawan dixwin? E minş min ditiyeş
George dom kir:
- Hin Ji wan şeş heft caran dizenş Bi vi awaja hem Ji
bo xwarineş hem Jiji bo firotine ew e tibabek kiroşken
me cebibinş Paşe em e cend kevokan Jiji xwe re xwedi
bikinş bila ew ji xwe re li dora eş bifirinş
Bi dilflrehi 11 diware di ser Lermie re niheri:
- We ev hemii bibin male meş We tu kes nikanibe me
biqewirineş Ger yek li xweşa me neceş em e je re bejin;
heydeş hereş Ger ew mer be bila ew neceş Ger dostek were
mevandariya meş we ji bo wi nivineki me ye cihgir
hebeş Em e je re bejin, "Cima tu işev li ba me namini?"
E^w e Ji bimineş We kiicikeki me ye necire u du-se
pisiken me hebinş Le bele plsik celiken kiroşkan
dixwinş dive tu bi diqet biş
Lennie bl hez behna xwe dight ii berdidaş
- Ka bila ew bixwinş hingi ez e nişani wan bidim be
ka dinya cend koşe yeş
Behna wi hate ber wiş Ew di hundire xwe de dimlriqiş

Wi fort li pisiken ku we bela xwe di kiroşkan
bidana, dikirş
George xwe avetibii hembeza xeyalen xwe yen berzş
Gava Candy dest bi pejrve klrş mina ku herdu Ji li
ser siic hatibin glrtin, Ji cihe xwe hol bunş
Canctygot:
- Ma hiin ciheki wilo nas dlkin?
George tavlle bi xwe ve hat:
- Em nas blkin neis nekin, Ji te re ci lazim e?
70
- Na canoş min negot wi cihi ji min re bibejinş II ku
dibe bila bibeş
- Rast eş George gotş Ger tu bi sedsalan li ciheki wilo
bigeriş tu nabiniş
Candy bi rewşeke bi heyecan gotş
- Gelo Ji bo ciheki wilo ciqasi dixwazin?
George bi caveki bi şik 11 wan nlheri:
- Ehş ez bawer im ez e bikaribim bi şeşsed kaxezan
bibinim, gotş EXv kal ii piren ku le riidinen miftis biineş
U pire Ji hewcedari emeliyateke yeş Le ez Ji te re
bibejim, cima tu teklli kare me dibi, cima tu poze xwe
dixi nava keire me?
Cancty got
- Ez peyaki wilo me, ku ez bl desteki tene bl keri kar
nayemş Min deste xwe 11 ve ciftlike wrlnda kirş Ji ber ve
yeke ew niha kar maren xwe yen biciik bi min didine
kirinş Ji ber windeikirina deste min wan du sed ii penci
dollar dane minş Min di rewşa iro de penci dollaren

din Ji xistine serş Niha hemii di banke de neş Li ser hev dikin sesed, pişti dawiya mehe ew e penci dollciren din Ji tekevin desten minş Guh bide min be ez e ci bejimşşş (Ew bi heraret daqul bii) Mln Ji bi xwe re bibin zarono, hiş hiin ci dibejin? Ez diksirim sesed ii penci dollari texime vi kariş Ez zede bi keri kar nayem, le ez dikarim xwarine cebiklm, dikaulm 11 mirişkan binerimş dikarim hineki ji tevrika bexce biklmş hi, hiin ci dibejln?
George caven xwe nevi glrtinş
- Ka ez biftklrimş gotş Ji ber em fikiribiin ku tene em e herdu vi kari bi hev re biklnş
Candy peyva wi birri:
- Ez e wesiyetnameke amade bikimş Ji ber ku ez be kes ii kiis imş ez bimirim we para min ji we re bimineş
71
Ma peren we hene? Dibe ku em tavile bikaribin vi kari bikin?
George bi acizi tif kir:
- Hemii peren me yen ku heneş deh dollsir inş (Bi rewşeke bi ftkir bi ser ve zede kirş) Guhdari bike, ger ez u Lennie meheke btxebitin u qet mesref nekin, we sed dollaren me ceblbinş Tevli yen te dibe carsed ii penciş Em e bikaribin bi van peran kare xwe blxine reş Tu ii Lennie hiin e bi wir re mijiil bibin, ez e Ji bo deyne me ye ku bimineş Ji xwe re kareki bibinim, hiin ji dikarin di we nave de hekan biftroşinş
Eiw bedeng mamş Bi ecebmaja li hevdu diniherinş Ew xeyala ku wan qet bawer nedikir we bibe rasti, niha li

rastiye geriyabuş
George bi pesindan got
- Lawo me kirri u xelasş
Bi heyrani diniheriş hedika ducare kir:
- Me kirri u xelasş
Candy li qireixa nivina runiştş Mile xwe ye Jebiiyi bi
rik xurandş
- Ez beri niha bi car salan seqet biimeş gotş Li ku be
wexti ew pehineke li qiina min bixlnş Gava ez tekevim
rewşeke wiloş ku nikanibim odeyeke Ji bimalimş hmgi
ew e min bişinin Mala Belengazanş Ger ez pere xwe
bidim we ii gava ku kareki mina ye mirovan Ji min
neye, belki hiin destur bidin, ku ez bexce we tevir
bidimş Ez e firaxan bişom u weki din keir maren hur Ji
bikimş Qet nebe ez derden 11 ber deriyen xelke
naklşinim ii li mala xweş kare xwe biklmş
Bi dengeki xemgin bi ser ve zede kir:
- We ditbe işevci kirinji kiiclke minş ne walo? Ew
dibejinş feda wi ji kesi re tune yeş dibejin feda wi Ji xwe
72
re ji tune yeş Gava ew min bavejin derş qet nebe yek
rabiiya ii bi xera xwe gulleyek berda sere minş ez e ji xwe
re xelas bibiimaş Le kes ve nakeş Ciheki ku ez herime we
tune be; ez e nikaribim li tu deran kar bibinimş Heya
hiin Ji vir herinş we si dollaren min yen din Ji
gihiştibin ser hevş
George rabiiş le disan runiştş Ew bi spehibuna
xeyalen xwe dilşa biiş Hemu 11 rastgerina we xeyala

spehi difikirinş bei ku tevbilivinş wilo runiştibiinş
George xeyala xwe bi kar tani:
- Mesele rojeke cejn eş an Ji canbazxaneyek hatiye
bajerş an Ji maceke basketbole heyeş ez ci zanlmş gelek
tişten dinş
Candye kal sere xwe hejandş
George:
- Em e rabin herinş ma we ci bibe? got Em destiire Ji
kesi naxwazinş Bi tene ku em bejin "heyde em herin",
em e rabin ii herinş Em celekan bidoşin, hinek xwarin
bidin mirişkan ii em e rabin herinş
Lennie:
- Em e gihe Ji bidin kiroşkanş Ez e xwedikirina wan
qet Ji bir nekim, gotş Em e kengi vi kari bikin, George?
- Plşti meheke dinş Tam pişti meheke dinş Tu zane ez
e ci bikim? Ez e nameke ji yen ku li wir riidinen re
bişinim ii ez e haya wan bigihinime ku em e wir bikirinş
U we Camdyji sed dollari beye bişineş
Candy:
- Ji xwe, gotş Sobeyeke wan a baş heye, ne wilo?
- Ere, sobeyeke wem a baş heyeş Ew hem ezingan,
hem Ji komire dişewitinlnş
Lennie:
- Ez e kiicike xwe ye bicuk ji bibim, gotş Bi namus we
73
ew clh gelek li xweşa min beş
Denge Ji derve nezik dibiiş George bi lez ii bez got:
- Ji kesi re tişteki nebejinş Bila ji me hersiyan pe ve

kes pe nizanibeş Ew e me ji vir biqewirinin, da em
peran qezenc nektnş Dive mina ku em e di hemu Jiyana
xwe de ceh bikişininş em tevbigerinş Paşe rojeke em e
heqe xwe bistinm u em e lexin herinş
Lennie u Candyji kefam ru li xwe qermicandin ii bi
seriyan tesdiq kirinş
Lennie xwe bi xwe got;
- Dive Ji kesi re neye gotinş
Candy got:
-George!
-Ciye?
- Diviyabii min kiicike xwe bikuştaş Georgeş Diviyabii
min destiir nedaya ku yeki biyani kiicike min
bikujeş
Deri vebiiş Slim kete hundirş dii re Ji Carlyş Carlson
u Whit kettn hundirş Desten Slim Jl qire reş bubiiş ew
eceb hers biibiiş Carly bi enişka wi ve zeliqi biiş
Carty:
- Min bl armanceke xerab negotş Slimş Tene min got
ez careke bipirsimş
Sllm:
- Baş eş le tu ewqeisi plr dipirsi kuş a hatiye vira minş
ilelah yaho! Ma siice mln e ku tu 11 Jlna xwe ya piroz ne
miqate yiş Sere mln neeşine!
- Cane min, min got ya, ku min bi armanceke xerab
negotlyeş Min got belki te ditiye, loma mln pirsiş
Carlson xwe avete nave:
- Cima tu e nebejiş Jina ku te got dlve li mala xwe

riineş Ger ew wilo nivingeh bi nivingeh civan blde xwe
74
ii bigere, ew e rojeke sere te tekeve belaye, edi tu e nlkanibi
tişteki bikiş
Carly tavile hol bii ii li Ceirlson zivlri:
- Dive mirov tekili kare xelke nebe, an na ew e
mirov blqewirininş
Carlson keniya:
- Kuro ehmaqe serseriş Te xwest ku tu bela xwe di
Slim bidi, le cenebu, wi heqe te da teş Ditirsim ew mina
kiroşkan be, boksore welet ye heri baş e, ez guh nadim
gotinen wlsaş Ger Ji te te tu were bela xwe di min bideş
Kuro, eger ez yeke li te blxim, ez e riiye te bişibinim
mazata carşemeş
Candyji bi dilşahi şirikatiya erişe kirş Bi qehir:
- Lepikeki hundire wi tiji vazelinş tuhş gotş
Carly bi hers li wi niheriş Caven xwe Je dagerandin
ser Lennieş Lennie he Ji bi xeyala ku ew e ciftlike bi dest
bixineş bi mesti dibişiriş
Carly mina kiicikeki ket btn cengen Lennie:
- Tu ci dikeni kuro?
Lennie bi şaşmayi 11 wi niheriş
-Hi?
Carly bi hari xwe vala kir:
- Ka tu were vlr, xergeleş Rabe ser xweş Ji te weye ku ez
e destiir bidim ii lawe orospiyeke weki te bi xwe
bikeninim? Ez e niha nişani te bidim be ka ye tirsonek
kiyeş

Lennie bi rewşeke aciz 11 George dlniheriş Rabu il
xwest ku bi paş de hereş George xwe xistibii weziyeta
bokseş Wi peşi bi deste cepe boksek li Lennie xist, paşe
ji bi deste raste boksek tam 11 poze wi xistş Lennie Ji
tlrsan qiriya ii xwin Ji poze wi der buş
- Georgeş wi bi qerin bang kirş Ji vi re beje bila 11 min
75
nexeş Georgeş
E^ heya ber diwer vekişiyaş Carly da dii wi u bi berdewamii
li ser caven wi dixistş Lennie desten xwe billnd
dikirinş le bi qasi ku ew nikaribe xwe biparezeş tirsiya
bu
George rabiibu ser lingan ii diqiriya:
- Meseklne Lennie, tu Ji le xe!
Lennie bi desten xwe yen mezin riiye xwe girtş Ewji
tirsem dinaliyaş Qiriya:
- Je re beje bila II min nexe, George!
Carly we caxe yek li valahiya zike wi xist u behna wi
cikandş
Slim Ji cihe xwe rabii:
- Xayine pis, bi qerin gotş Ez e niha dersa te bidime
teş
George deste xwe direj klr ii Slim da rawestandinş
- Saniyeke! bl qerin gotş
Desten xwe li peşiya deve xwe kirin siper u heta ku Je
hat qeriya:
-Lexe, Lennle!şşş
Lennie desten xwe Ji ber riiye xwe hilanin u caven

xwe li George gerandinş Carly ve care yek li ser caven
wi xistşş Bi we ledane ruye Lennie ye fireh di nava
xwine de maş
George careke din Ji qiriya:
- Le xeş Lermieş metirse!ş ş ş
Gava ve care Carly deste xwe bilind kirş Lennie bi
deste wi girtş Pişti demekeş Carly mina masiyeki ku bi
sere şewke ve gej bibe, kete xwareş Deste wi ye girti di
nava deste Lennie ye mezin de winda buş
GeoiTge bi bez hate ba wanş
- Dev Ji wi berde Lennie, dev je berde!
76
Le Lenniee ku ketibu tirseheze, li ketina merike ku wi
hişk pe girtibii, temaşe dikirş Ji ruye Lennie xwin diherikiş
Caveki wi Ji ber werimandine hatibu girtinş Georg
cend şimaq (sile) avetin riiye wiş Lennie heji deste xwe
venedikirş Carly di we nave de weke kilse spi biibii, ew
Ji cihe ku le ketibii, qet xwe tev nedilivandş Gava deste
wi di nava deste Lennie de dieciqi, tene diqiriyaş
George bei navbir diqiriya:
- Deste wi berde Lennieş Slim, baz de alikariye bike,
an na ew e tu xer di deste merik de nemineş Lennie bi
careke ve dest Ji necira xwe berda u cii li quncikeke
xeni runiştş Bi awayeki bitirs:
- Te gotş min Ji kirş Georgeş Min nexwest ez tişteki
bikimş
Slim ii Carlson bi ser wi de daqul bunş Paşe Slim
rabii ii bi hiseke bi tirs Ji Lennie re got:

- Dive em wi bibine doktorş hestiyen wi hemii hiir hiiri buneş
Lennie bi qerin got:
- Min nexwest ez tişteki bikimş min nexwest ez wi bieşinimş
Shm:
- Carlsonş baz de erebeş em e herin 11 Soledade deste te bipecinş
Carlson bi lez derketş Slim li Lenniee ku li ber giri buş ziviri:
- Ne siice te yeş gotş Ewji mej ve dixureş Ieşşş Lawo bi merik re bi nave dest tiştek nema yeş
Slim bi lez derket derveş tasek tiji av ani ii da ber deve Carlyş
George got:
- Sllmş ma tu dibe we paseporte bidin
77
me?Hewcedariya me bi peran heyeş Ma we niha bave Carly paseporte blde me?
Sllm bişiri, li ba Cctrty li ser congen xwe riinişts
- Ma bi qasi ku tu gotina min fehm biki tu hatijn ser xwe?
Carty di mana ere de sere xwe hejandş
- We caxe guhdari bikeş Hebe tune be we deste te ketibe ber makinekeş Ger tu tişte ku bi sere te ve hatiye Ji kesi re nebeji, em ji nabeJinşLe ger tu ve buyere bibeji ii tu btxwazi vi lawiki biqewirini, ew e rastiya ciroke Ji her kesi re bibeje, tu e ji rezil bibiş

Carty:
-Ezt Uşteki nebejimş gotş
Wi nedixwest ku 11 Lennle binereş
Ji derve denge tekereki hatş Slimji rabuna Carly re
bu alikarş
- Heydeş wereş Carlson, ez e te bibim doktorş
Ewji Carly re bu alikar ku ew derkeve derveş Denge
erebeya ku Ji derve dihat bi diir ve ciiş Pişti biskeke
Slim disan vegeriya odeş Li Lenniee ku he Ji xwe Ji
Ursan di quncike de guncifandibii ser hevş niheriş
- Deste xwe nişani min bide!
Lennie desten xwe direj kirş
- Wey li min, caven min Ji te tirsiyane, Slim gotş
George xwe avete nave:
- Lennie Ji wi tirsiya ii nizemibii we ci bikiraş Min Ji
te re negoUbuş ku pevcuna bi wi re ne kare aqilcm eşNa,
qey min evji Candy re gotibuş
Candy bi nerineke Jl dil pejirand:
- Temam, gotş Gava he ve slbehe Carly bela xwe di
hevale te dabii, te goUbii ku; "Ger tu bela xwe di Lennle
nedi tu e baş bikTş Ev e, te ejmi wilo Ji min re gotibfiş
78
George 11 Lennie ziviri:
- Ne siice te ye, got Edi ne hewce ye ku tu bithBiş Te bl
gotina min klrş Le ger tu heri hebeki ruye xwe bişoja we
baş bibeş Ruye te berbat buyeş
Lennie bi leven xwe yen eşiyayi bişiri:
- Mtn nedixwest ez sere te texim belaye, gotş

Ew ber bi deri ve meşiya, le li ber deri sekini ii 11 dii
xwe ziviri:
- Geoige!
-Ciye?
- Ma disan ez e li kiroşkan binerim, George?
- Ji xweş te tu Uşt nekiriye ku?
- Armanceke min ya xerab tune buş Georgeş
- Heydeş here riiye xwe pak bikeş
79
Seyise reşik Crooksş li odekeke cigehe zine hespan
ya ku bi diware exur ve biiş dimaş Li aliyeki oda biciik
pencereyeke carqorziş li aliye din Ji deriyeki bicuk ku
11 exur vedibii, hebuş Nivine Crooks Ji sindoqeke direj i
hundur tiji ka pekhatibiiş Wi betemiyen xwe li ser
sindoqe radixistinş Zinen qetiyayi yen ku we bihatina
dumstkirin ii percecermen nu bi cengelen ber pencere
ve bi dardekiri bfinş Tam di bine pencere de Ji dezgeheke
nizim hebfiş Li ser we dezgehe aletş keren
seritewiyayiş derziş guloken ta u direşeke bicfik hebiiş
Bi cengeleki ve Ji nireki şikesti u hefscireki ku muyen
hespan pe ve zeliqi bfin li ba dibfinş Di ser nivine
Crooks re Jiş sindoqeke sevan bi dardekiri bfiş Di
hundure sindoqe de dermanenji bo wi fi Ji bo hejwanan
bi rezkiri bfinş Ji bo xwediti u leniherina zinen
hespanş qutiyen sabune yen pewistş di hundure kodikeke
qire ya bi qulp de Ji, doxa firce dixuyaş Gelek
alaven şexsi li erde pehnkiri bun; Ji ber ku Crooks bi
tena sere xwe dimaş wi pewist nedidit ku ew alaven xwe

bi rek fi pek bi clh bikeş Ji ber ku kcire wi Ji yen
karkeren din domdartir buş bi deme re gelek hur
miiren wi cebiibiinş
Cend cot solş cotek gizmen lasUkiş saeteke bi zengil
80
i mezin ii tivingeki wi ya yekderb hebuş Pirtiiken wi Ji
hebun; cildek kevin ya qaniinen Kalifornaye yen
medeniş neh-deh pirtiiken gemariş li ser refeke II jori
nivine wi hatibun blcih kirinş Bercavkeke Ji qalike
kiisiyan ku di ser nivine wi re bi mixeki daliqandi biiş
li ba dibiiş
Ode hatibii rejkirin ii heta tu bixwazi pakij biiş Ji ber
ku Crooks peyaki Ji xwehezkiri ii bi riimet biiş wi 11
hember kesi behurmeti nedikirş Herweha wi nedtxwest
kes Ji 11 hember wi behurmetiye bikeş Ji ber ku hestlye
pişta wi şikestibuş laşe wi hebeki ber bi cepe ve xwar
dibii, caven wi yen ku di kortalen xwe de kur cubiin, Ji
ber kiirbiina xwe geleki birqok dixuyanş Qermicoken
kiir, di riiye wi ye Jar de hebiin; leven wi yen zirav i bi eş
gihiştibun hev ii Jl renge riiye wi he vekiritir bunş
Evara şemiye biiş Ji deriye vekiri ye ku li exur
diniheri, denge lebitina hespan, denge nalen ku li erde
diketin, denge qircina diranen ku şiret li deme dikirin
u denge rişmen zinciri dihatin bihistinş Lempeyeke
elektirike ya biciik li oda seyis şewqeke sivik u zer
didaşşş
Crooks h ser nivine xwe runiştibuş Jera gomlege wi
Ji ber pantore wi derketibiiş şuşek zeyte di deste wi de

bii, bi deste din Ji hestiye pişta xwe diftrkandş Car
cargm cend dilop zeyt berdida ser kefa deste xwe a
pembe, di bin gomleg de dibir ser pişta xwe ii disgm diftrkandş
Rehen pişta wi dihatin hev ii diricifts
Lennie di deriye veklri re xuya biiş Hema beje Navmila
wi ya fireh hemii valahlya deri dagirt ii ew wilo II
wir sekini u niheriş Peşi Crooks ew neditibiiş le gava
wi sere xwe bilind kirş II riiye wi ifadeyeke nerazibiine
peydabu u destexwejlblne gomlege xwe kişandş
81
Lermieye ku xwe şaş kir da ci bikeş bi xwestekeke dostane
bişiriş
Crooks bi dengeki berz got
- Mcife te tuneye ku tu tekevi ve odeş Ev ode ya min eş
Ji min pe ve kes nikane tekeve virş
Lennie xweziya xwe daqurtand u he beUr bişiri:
- Ez tişteki nakimş gotş Ez hatime cewrike xwe
bibinimş Min dit ku oda te rohni yeş min got ka ez
herim btaerimş
- Ma mafe min tune yeş ku ez şewqe pexim? Heydeş Ji
oda min derkeve! Hiin naxwazin ku ez werim odeyen
we, ez ji naxwazim ku hun werin oda minş
Lennieje pirsi:
- Cima ew naxwazln ku tu heri odeyen wan?
- Ji ber ku ez reş imş Ew herUm digel hev bi kaxezan
dlleylzinş le ew bi min re naleyizinş Sedema we Ji
reşlkbiina min eş Bi ya wem behna geni Ji min teş Ez ji
te re Uşteki bejlmş esil behna geni Ji we teş

Lennie eceb hers bfi ii zireceben desten wi pe ve daleqiyanş
- Her kes cii bajer, gotş Slimş Georgeş hemuşşş George
Jl min re gotş tu li vir bimini u biaqil beş Min dit ku
şewqa te pekeU bfişşş
- Yani tu dixwazi ci bibeji?
- Hicşşş Min şewq ditş Min got ez herim bistikeke
riinemş
Crooks Lennie baş di cav re derbas kirş Wi paşe
bercavka xwe ji ber pişta xwe derxist fi da ber guhen
xwe yen pembeş Paşe disan 11 Lennie niheriş itlraz klr;
- Baş e leş tu e 11 exur cl biki? Tu ne erebavan e Jiş Ci
kare te bi hespan re heye?
Lermie:
82
- Ez hatime kficlke xwe bibinimş gotş
- Ke bi te gtrUyeş here kiiclke xwe bibineş Le II cihe ku
kes te neveş mece wh*ş
Lennie hew bişlriş Wi ber bi deri ve gavek avet, le
hate bira wi, disan ber bi deri ve vekişiyaş
- Min hebeki li wan niheriş Slim dibejeş zede cewrikan
mist nedeş
Crooks:
- Ji xwe kar fi işe te ew e ku tu wan Ji sindoqe dendniş
Ez ecebmayi diminimş ku cawa diya wsm cewriken xwe
Ji ber te nabe ciheki dinş
- Qet ne xema we ye fi ew guh Ji nade minş
Lennie disan ber bi ode ve meşiyaş
Crooks biruyen xwe tiij kiribunş le bişirina Lennie

ya bi dileki safş zora berxwedana Crooks birş
- Derbas beş hebeki riineş gotş Tişte ku tete
fehmkirinş te sond xwariye ku tu e min rehet neheli,
we caxe derbas blbe, were rfineş
Denge wi hin ji hundur dihatş
- Demek hemii ciine bajerş ha?
- Hemii cfineş tene Candy mayeş Ew li nivingehe
runiştiyeş penfisa xwe tiij dikeş Ji aliyeki ve Ji hesaban
ce dikeş
Crooks bercavka xwe rast kir:
- Hesaban cedike? Candy hesaben ci cedike?
Lennie bi dengeki bllind got:
- Ji bo kiroşkan!
- Tu dehn iş Crooks gotş Tu zirdehn iş Tu ci behsa
kiroşkan diki?
- Ez behsa kiroşken ku em e bikirinş diklmş Ez e II
wan mlqate bim, ez e gihaye bidime hev ii ez e ave
bidime wanş
83
Crooks:
- Bi rasUJi tu dehn i, gotş Ew merike ku hiin bi hev re
digerin, ne be sedem e ku wi tu girttye ba xweş
- Ez rast dibejimş Em e wira bikirinş Em e ciftlikeke
bicfik bikirin fi 11 wir mina maldgiran bijinş
Crooks li ser nivina şiina xwe xweşUr kir:
- Riineş got Li ser weirila mixcm runeş
Lennie hedika 11 ser warila mixan riinişts
- Ji te weye ez derewan dikimş le ez derewan nakimş

Tişten ez dibejlm hemii rast inş Ger tu Ji min bawer naki tu dikari ji George bipirsiş
Crooks cenga xwe ya reş xist nav kefen desten xwe yen pembeş
- Tu bl George re digeriş ne wilo?
- Ereş Lennie gotş Em herdu bi hev re dicin her dereş
- Yekcaran ew tişUna dibeje, le tu qet Je fehm nakiş ne wilo?
Ew daqiil biiş bi caven xwe yen kur Lennie di cav re derbas klrş
-Wlloşşş car ceirgmş
- E^v peyva xwe dom dlkeş le tu Uşteki Je fehm nakiş
- Wiloşşş car caranş le ne her Umş
Crooks xwe ji qiraxa nivine xwe tewand:
- Ez ne Ji reşlken başiir imş gotş
Ez 11 virş li Kalifomaye hatlme dineş Bave min heywan xwedi dlkirş Bl qasi penc hektaran erde wi hebiiş Zaroken spiyem Ji bo listike dlhatin mala meş di nava wan de yen geleki bl terbiye Ji hebiinş Bave min Ji ve yeke hez nediklrş Ez plşti demeke dlrej tegihiştimş be clma bave mln Ji we yeke hez nedikirş
Eiw seklniş gava careke din dest bi peyva xwe kir, denge wi hej xweşUr bii:
84
- Li wan deran malbateke reşik ji tune biiş Nlha ji II ve clftlike reşikek tune neş Li Soledade Ji bi tene mcdbatek heyeş(E^v keniya) Ez dipeyivim ya, tu guh mediye, ma ye ku dipej^ve reşik e?

Lennieje pirsi:
- Tu dibeji kengi ez e bikaribim van cewrikan mlst
bidim?
Crooks disan keniya:
- Ji te re her tişt te gotinş mirov emin e ku we Ji mirovine
din re neye gotinş Heya bi du hefeteyan we cewrik
baş mezin bibinş George peyaki zanepeyv eş Ew dibejeş
ku tu Ji gotineke Ji fehm nakiş(Ew daqul bii) Guh
mediyeş ev gotinen reşikeki ne, hem Ji gotinen reşikeki
seqet eş Yani gotinen vala neş Le cawan be Ji tu van di
bira xwe de biheliş Ev ne cara yekem e ez ve dibinimş ev
hezar car inşşşYek behs dikeş behs dikeş ye din
nabihize, ango ew fehm nake, tu guh mediye, hemii
vala neş Mesela eslin, peyivina mirovan eş an Ji bi
zimane xwe bigire ii li quncikeke runeş Dawiya maye tu
guh mediyeş
Heyecana wi zede dibiiş bi destan 11 congen xwe
dtxistş
- George dikare komek gotinen cirto virto bibejeş we
cl Je derkeve? Mesela giring ew eş ku mirov bikeiribe bipejiveş
E^v sekini, denge wi xweş biibiiş toneke baweri denge
wi glrtibiiş
- Ferz bike ew bi paş ve vegeriyaş Ferz bike wi le xlst
ii ew ciiş Tu e ci biki?
- Ez nizanimş gelo bi rasti armanca wi ci ye? wi bi
qerin gotş Tu derewan dikiş George birindar nebiiyeş
- Ez Ji te re dibejimş be tu e bibi ciş We te bibin
85

dehnxaneş We toqeke mina ya kiicikan texm stuye teş
Caven Lennie bi hersbiinek behawe ber bi peye ve
zivirinş Ew rabu ser xwe u bi awayeki taliike ber bi
Crooks ve ciiş
- Ke dest George daye?Je ph^iş
Crooks dit ku taliike nezik dibeş Ji bo ku ew xwe
bipareze wi xwe bi paş ve kişandş
- Ez tene ferz dikimş gotş Tiştek bi George nehatiyeş
E^v mina pivazterkan eş Ji xwe ew e bl paş de vegereş
Lennie di ser sere wi re rawesttyabu:
- Cima tu ferz diki? Ez naxwazlm kes ferz bikin ku
Uştek bi sere George ve hatiyeş
Crooks bi xweşi got:
- Dibe ku tu niha fehm bikiş Georgee te heyeş Tu
dizani ku ew e bi paş ve vegereş Biftkire ku keseki te
tune yeş Biflkire ku tu reşikek iş tu nikari tekevi
odeyeke u bi kaxezan bilejriziş Bifiklre ku tu mecbiir i
II vir riine ii pirtiikan bixwiniş Ere tu e bikaribi heta
evaran bi nalan bileyiziş le tu e bi şevan tekevi odeya
xwe ii Ji xwendtna pirtukan pe ve tu e nikaribi tişteki
bikiş Plrtukji ne hejane penc peremş Esil tişte pewist
hevalti yeş peydabuna caneki yeş
Jl bo ku Lennie Ji meraqan rlzgar bibeş bi dengeki bi
Ursgot:
- We GeoiTge vegereş Dibe Ji ku niha ew vegertya beşKa
ez e herim binerimş
Crooks got:
- Min dixwest ku ez te bitirsinlmş Ji xwe ew e wereş

Mln behsa xwe dikirş Yeki ku bl şevan 11 vlr riidineş pirtiikan dixwine ii difikire, bine ber caven xweş Ew cama weke qumriya biikeke dlfikireş le tişte ku ew le difikire rast e ne rast e, yeki ku ewje bipirse Ji 11 ba wi
86
tuneş Ger ew tişteki bibineş rast e ne rast e ew nlzaneş Yeki ku ew li ser stiiye xwe bizivlre u bibeje, ma tu ji dibini, tune yeş Ew Ji tişteki ne emin eş Di deste wi de pivanek tune yeş Min 11 vir ci neditş Ez ne serxweş biim Jiş Ez nizgmlm be ez di xew de biim an naş Ger yek 11 ba min hebiiyaş we bigotaş te ew di xewn de diUyeş ez Ji hew diftkirimş Le ez niha nizanimş
Crooks niha 11 quncika ode ya din li pencere meze dikirş
Lennie bi awayeki dilşewat got:
- George nace derekeş ew min bi tene naheleş Ez dizanim ku George tişten wilo nakeş
Seyis bi rewşeke ku ew xajize xeyalen xwe biibeş dom klr:
- Te bira minş gava ez biciik biim, ez li ciftlika bave xwe ya mirişkan biimş Du birayen min hebiinş Ew tim li ba min biin ii bi min re biinş Em herse 11 eyni ode diman, di nava ejmi nivinan de radiketlnşşş Erdeki me ye tiiftringiyan ii mergeke me ya nefele hebiiş Gava roj bilind dibii, me mirişk berdidane nava nefeleş Birayen min 11 dora merge disekinin ii li wan miqate dibiişşşEiw cl mlrişken spi biinş
Lennie hedi hedi guh didane tişten ku dibihisttn:

- George got ku ew e Ji bo kiroşkan nefela me hebeş
- Kiroşken ci?
- We kiroşken me ii erdeki me ye tiifiringiyem ceblbeş
- Tu dehn iş
- Ez ne dehn imş ez rast dibejimş Ger tu ji min bawer
nakiş Jl George biplrseş
Crooks bi nerineke bicfikditini:
- Tu dehn iş gotş Min ci peyayen ku di vem riyan ii dl
87
van ciftlikan de derbas biineş ditineş Li pişten wan
tfiriken wan fi di seren wan de ji eyni beaqliya wan
hebfiş Min bi sedan yen wllo ditlneş E^v tenş paşe gava
kar xelas dibeş ledixin ii dicin; di sere her yeki Ji wan
de ciftlikek hebiiş Le yek Ji wan ji nebiiye xwediye
clftlikeke wiloş Eyni weke xeyala buhuşte yeş Herkes
dixwaze bibe xwediye erda xweş şş Min 11 vir komek
pirtfik xwendiyeş Yek Ji wan neciiye buhuşte, yek ji
wan ji nabe xwediye ciftlikeş Ew her behsa we dikin,
tene di sere wan de cihe we heyeş
E>w rawestiya ii II hela deriye veklri niheriş Ji ber ku
hesp bl teşqele tevdiliviyan, rişmen wan dikirin
şingeşingş Hespek hiriyaş
- Muheqeq yek 11 wir heye, Crooks gotş Dibe Ji ku
Slim beşşş Slhn cama şeve du-se caran dice exurş Slim
erebevemeki beiş eş E>w bi hejwemen xwe re mljiil dibeş
E^v bl zore rabu ser xwe ii nesald deri biiş
- Sllm tu yi?
Denge Candy bersiv da

- Slim ciiye bajerş Ll min binere, ma te Lennie
neditiye?
- E^v lawike girs?
- Ere, ma te ew 11 van deran nediUye?
Crooks bi kurtajn:
- Ew 11 vir e, gotş
E^v cii ii xwe li ser nivine xwe dlrej kirş
Candy II ber deri rawesUyabii, mile xwe ye Jekiri dixurand,
bi caven xwe yen ku Ji şewqe venedibiin II ode
temaşe dlkir u nedlxwest ku tekeve hundirş
- Ez Jl te re Uşteki bibejlm, Lennie? Min Ji bo
kiroşkan hesabek cektrş
Crooks bi dengeki bl hers:
88
- Ger tu bixwazi, tu dikari derbasi hundir bibi, gotş
Candy sekini:
- Ez nizanlmş Ger tu bixwazişşş
- Derbas bibe cane minş Ger yen din bikaribin
tekevln hundir, tu Ji derbas bibeş
Crooks nikaribii di bine perdeya herse de dilşahiya
xwe veşartaş Candy derbasi hundir bii, le he ji di
rewşeke cavtlrsiyayi de biiş
^\^Ji Crooks re got:
- Vir ciheki rehet eş Hebuna odeyek mirov ya wilo
taybeU, tişteki xweş eş
Crooks:
- Jl xwe, got ii bi rexa bi pencere ve, ma Ji vir xweştlr
ci heyeş

Lermle kete nava peyve:
- Te got Ji bo kiroşkan?
Candy xwe U ba nire şikesU sparte diwer ii mlle xwe
ye qop xurandş
- Ez Jl mej ve h vir im, gotş Crooksjiji mej ve ye H
vlr dijiş Le ev cara yekemin e ku ez oda wi dibinim
Crooks peyivi:
- Heval naxwazin werin oda reşikekiş Tene Slim ii
patron hatine vlrş
Cemdy tavile peyv guhert:
- Ya rasti erebevaneki mina Slim tune yeş
Lennie ber bi kalo ve daqiil bii:
- Te ci Ji bo kiroşkan dlgot?
-Min hemii hesab kirş Bi şerde ku em bi rtya we bizanlbln
em e bikeiribinji kiroşkan peran qezenc bikinş
Lermle got:
- Le ez e 11 w•'m blniherimş Tu e Ji li kiroşkem
biniheri, George Jl min re gotş Wi soz da minşşş
89
Crooks bi tundi peyva wi birri:
- Hun besedem sere xwe dieşinin, zaroknoş Hiin tene
bi behskirine dema xwe dibuhurinin, le hiin e tu cari
nebin xwediye erdanş Tu e hemii Jiyana xwe li vir bi
xulamti bibuhuriniş Min geleke mina we ditine, pişti
du-se heftan disan ew dikevin riyanş Tişte ku te
fehmkirin di sere her kesi de ciftlikek heyeş
Candy bi hers gema xwe mist daş
- Tu qet meraqan meke, em e vi kari bikinş George

gotlye ku peren wi Ji hazir inş
Crooks:
-Bi rasti? gotş Baş eş George li ku ye? Ki ci zane be ew
H kijan kei:xaneya bajer eş Ev eş ew pereyen we li wir
xerc dikeş Kuroş min yen wilo gelek ditineş Min ci
peyayen ku ciftliken xwe di sere xwe de hildigirin nas
kirinş Le ew qet nebiine xwediye tu ciftHkanş
Candy bi dengeki bihnd got:
- Ji xwe her kes we dixwazeş Ne pirş le ki naxwaze ku
erdeki wi ye biciik hebeş Tene erde ku mede te beş şş Tu e
bi reheti le bijiş kes te naqewirineş Ye minş tu caran
ciheki min ye wilo cenebuyeşSer qiseş min Ji hemu
xelken ve eyalete re erd candineş le ew zad ne yen min
biinş gava min ew zad cinin ji ew disan ne yen min
biinşLe em e niha vi kari bikinş George pere bi xwe re
nebiriyeş Peren me di banke de neş Ezş Lennie ii Georgeş
em herseş we her yeke me odeyek cebibeş We kiicikeki
meş kiroşken meş mirişken me ce bibinş Em e garise
terr bicininş Belki celekeke meş an Ji bizineke me
cebibeş
E)w bi xwe ji hejnrane we tabloya ku wi di sere xwe de
cekiribiiş ma ii sekiniş
Crooksje pirsi:
90
- Te goUbii pere hazir in?
- Ereş nive pir hazir inş Hinekje kem eş Bi xer heya
meheke em e dawlya maye Ji bidine hevş E>w ciftlika ku
em e bikirinş George ew ditiye jiş

Crooks deste xwe dani ser moviken pişta xwe u mist
daş
- Min heta iro neditiye, ku kes di vi kari de bi ser
ketineş Min mirov nas kirineş ku Jl bo ew bibin xwedi
erd, mina dehnan li wan hatibiinş Le her care, an
kerxcme, an Ji şahiyeke bist ii yeke mehe, ew peren di
desten wan de hemu dikire xweli ii dlciiş
EXvsekini:
-Kuşşş hewcedariya wi bi yeki belaş, an yeki ku bi
naniizike bixebite hebeş ez dlkarim werim alikariya
weş Ez ewqasi ne seqet imş ger ez blxwazimş ez e karibim
mina berazan bixebitimş
- Zaronoş ma kesiji we Carly neditiye?
Hemiiyan sere xwe ber bi deri ve zivirandinş Jina
Carly li wan diniheriş We xwe zede boyax kiribiiş Leven
we hindikji hev dibunş Mina ku ew reviya beş behna we
dicikiyaş
Candy bi riiyeki miriizdajn got:
- Carly nehatiye virş
Jinik he Ji Ji cihe xwe neliviyabiiş htneki bi wan re
dibişiriş neyniika tiliya desteki xwe di neyniiken
Ullyen girdike u eşede yen deste din didaş We caven xwe
Jl yeki dlguhartin u berra ser yeki din didanş Dawi:
- Li vir yen ku bi keri kar nayen hiştineş gotş Ma Ji
we weye ez nizanim be ew bi ku de ciine? Carlyji li wnr
eş Ez baş dizanim be ew ciine ku dereş
Lennie bi Jtxwecuyin 11 we guhdari dikirş Lebele
Candy u Crookse ku kefa wan reviyabiiş nedixwestln

91
caven wan H yen we bikevlnş
Candy got:
- Ger tu dizani ku ew 11 ku yeş cima tu te ii le dipirsi?
Jlnik bi awireke ku 11 xweşa we dicii H wan niheri:
-Ci eceb e, gotş Gava ez mereki bi tene ye bi sere xwe
dibinimş ez pe re baş li hev diklmş Le gava hiin herdu li
ba hev bin, şabaş ji wi kesi re ku bikanibe gotineke Ji
deve we derxineş Hfin her bi pistepist di ber xwe de dipeyivinş
We dev ji tiliyen xwe berdan, desten xwe danin ser
kulimeken xweş
- Hfin hemu Ji hev tirsonektir inş Ji tirsa ku we
hinek paşgotinlya we bikin, hun ziravqetiyayi dibinş
Pişti kelikeke Crooks got:
- Ya baş ew e ku tu vegeri mala xweş Niyeta me ya ku
em sere xwe texin belaye tune yeş
- Ji bo ci ez e sere we texim belayeş Qeyji we weye car
caran cane mtn naxwaze ku ez du gotinan bi hinekan
re bikim? Jl we weye ku mina kundan riiniştina li
male tlşteki xweş e?
Candy mile xwe ye Jekiri dani ser conga xwe fi bi
deste din hedika firkandş Paşe mina ku bi ser we de
bipeke got:
- Mere te heye! Cima tu 11 dii meren din digeri fi sere
wan dixi belaye?
Jinik hers bfi:
- Mere mln heyeş Hiin hemu pe dtzanin be ew ci mal
eş Kar u işe wi ew e ku ew e cawa mirove ku ewje hez

nake neheq derxine ii xwe bipesinineş Ji xwe ewji kesi hez nakeş Ji we weye ku mirov di ve mala ne hejaye penc peran de rehet dike? An Ji ma guhdariklrina li Carly, ku wi cawan peşi bi kulma cepe eriş klriye fi
92
paşe cawan bi kulma raste lexistiye, xweş eş Ew yek, dido, dibeje fi ye II hemberi wi II ser pişte li erde direj dibeş
Ew sekini, ifada herse ji ruye we winda bii fi bi awayeki guhdayin,
- Rast eşşş gotş Ci bi deste Carty hatiye?
Bedengiyeke ne xweş cebfiş Candy dl bin cavan re li Lennie niheriş Paşe kuxuya:
- We ci bibeşşş Carly deste xwe xistiye ber makine, deste wi pelciqiyeş
Jinike biske 11 wi temaşe kir, paşe bi pirqin keniya:
- Derewnn! Min nexapinlnş Hebe tune be we Carly dl destpeke de xwestibe kareki mezin bikeş Ketiye ber makineşşş Zirtonek e! Le Ji cirka ku deste wi eciqi yeş wi ew yek u didoyen xwe yen meşhfir Ji kesi re nehiştiyeş Kiji heq wi hate der?
Candy di ber xwe de tekrar kir: "Deste wi ketiye ber makine"ş
Jinike bi awayeki biciikditini:
- Me fehm kirş me fehm kirş gotş Heta hiin dikarin wi biparezinş Ma qey xema min e? Hela bala xwe bidin van dinyaneditanş ew dixwazin min bixapininş Hiin min ci dihesibinin haş maji we weye ez melkesa kucan

im? Ez Ji we re tişteki bibejimş ger min btxwestaş ez
karibum bibfima artisteke tiyatroyeş Hem Ji ne tene Ji
bo listikekeş Yeki Ji min re goUbu ş wereş em e di
sinemaye de roleke bidin teşşş
Ewji qehrem wexti bifetisiya:
- Evaren şemiyan her kes Uşteki dikinş Her kes! Le
ezş ez cl dlkim? Ez rfiniştime fi bi komek dlnyaneditan
re dipeyivimşşş Yeki reşikş yeki dehnş yekji şivaneki bi
kec fi spişşş Di ser re ji ev H xweşa mHi diceş Ji ber ku mi-
93
roveki din tune yeş ku ez pe re bipej^vimş
Deve Lennie Ji hev ciibfi, li we guhdari dikirş Crooks
xwe xistibfi pişt we bedewa peu-ezer a reşikanş Cemdye
kal hate guhertinş Ew bi careke ve rabfi ser xwe ii
bermila di bin wi de wergeriyaş Bi hers:
- Edi denge xwe bibirre, gotş Em naxwazin tu weri
virş Evqasş Ev cend car in ku em Ji te re dlbejin, neye
virş Ez ji te re tişteki bibejim; tu di derheqa me de
geleki şaş diftkiriş Di vi mejiye te ye bi qasi ye cfikan
de ger picek aqil hebiiyaş te e fehm bikira ku em ne Ji
taxime serseriyan inş Ferz bike te em avetin derş Ji te
weye em e tekevin riyam ii 11 kareki mina vi kare cenabetş
roje bi bist ii penc sentcmş bigerin? Ma haya te je
heyeş ku ciftlika meş helina me bi xwe yeş Em ne
mecbiir in H vir biminlnş Maleke me heyeş mirişken
me heneş daren me yen feki heneş ciftlikeke me ya Ji ve
ciftlike bi sed cari xweşiktir heyeş Dosten me Ji hene;
ereş dosten meşşş Dibe ku em camaji qewirandine tirsiya

binş leş ew roj derbas biinş Erde me bi xwe heyeş
male me bi xweş ger cih 11 me teng bibe em e bicine wirş
Jina Carty heneke xwe pe klr fi keniya:
- Blavejeş gotş min yen weke we pir ditineş Ger di
berika we de bist sent hebfiya hiin e bicfina bajer, we e
du qedeh whisky vexwarana fi paşe Ji we e bine
qedehen xwe bialastaş Ez bi we dizanim be hfin ci mal
inş
Riiye Cimdy sor dibii, le he beri ku Jinik gotina xwe
biqedineş ew bi xwe ve hat ii bfi haklme xweş Bi hedika:
- Diviya bfi ez bifikiriyamaş gotş Geloş nabe ku hun
bere cembera xwe bl ciheki dln vektn? Tu gotina me Ji
we re tune yeş Ciye me heyeş clye me tune yeş em dizaninş
me hun nas kirine, nas nekirine ne xema me yeş Jl
94
ber ve yeke ger tu ji vir heri tu e baş bikiş ci dibeş ci
nabe; belki II xweşa Carly neceş ku ew Jina xwe 11 ba
refek serseri bibineş
Jinike caven xwe 11 ser hemfiyan gerandş le kesi guh
nedane weş Le we he betir li Lennie niheriş Lermie aciz
bii ii sere xwe bera ber xwe daş Jinike bi careke ve got:
- Ke ruye te wilo helişandiye?
Lennie bi sucdari li ruye Jinike niheri:
-Kişşş Maez?
- Ereş tuş
Lennie di bin cavan re xwest ku Candy were hawara
wiş paşe disan wi li congen xwe temaşe klrş
- Carly deste xwe xistiye ber makineş gotş

Jina Ceirly keniya:
- Hate fehmkirinş makineş Ez e paşe bi te re bipeyivimş
Makine H xweşa min dicinş
Candy xwe avet nave:
- Vi lawiki rehet biheleş Tekili wi mebeş Ez e gotinen
te bigihinlm Georgeş Ew destfir nade ku tu teklH Lennie
blbiş
- George ki ye? pirsiş Ew lawike hurik e ku bi te re
hatiye?
Lennie keniya:
- Ereş ew eş gotş Ew e ye ku we bihele ez 11 kiroşkan
miqayet bimş
- De here tujiş ger xwestina te hemfi ev beş ezji dikarimji
te re kiroşkan bikirimş
Crooks Ji ser nivine xwe rabu u H hemberijinike rawestiyaş
Bi nerineke sar:
- Baş eş gotş Mafe te tune ye ku tu weri odeya yeki
reşikş Mafe te qet tune ye ku tu weri ii vir tevlihev bikiş
Heydeş ziiş Ji vir hereş An na ez e Ji patron re bibejlmş ew
95
e ciina te ya exur qedexe bikeş
Jinik bi nerineke biciikditini 11 wi zivlri:
- Li min bmereş reşikş gotş Ger tu deve xwe ye geni
negiri, tu dizani ez e ci binim sere teş
Crooks bi tirs H we niheri, paşe cii li ser nivine xwe
runişt ii xwe klşand qalike xweş
Jinik neziki wi bii:
- Tu dizani ez e ci biklm, ne wilo?

Her ku dicu Crooks biciiktir dibu, xwe bi diwer ve zeliqandibiiş
- Ere, xanimş
- We caxe hede xwe bizanibeş percereşik! Ez dikarim
te bi guliyeki dare ve bidime daliqandin; hem Ji wilo bi
hesaniş
Wer ku Crooks xwe klşandibii ser hevş hema bejeş ew
nema biiş Edi ne şexslyeta wi mabiiş ne Ji ezitiya wi; tu
tişteki wi ye sempati an Ji antipati ku hişyar bikira
nema buş
Bi dengeki ku Jl tirsgm dilerizi:
- Ereş xanim, gotş
Jinik H ser sere wi sekini ii H benda wi ma ku ew Ji
bo erzşikandine tevbiliveş
Le Crooks qet tevneliviya, wi bere xwe guhert ii
hemii clhen xwe yen nazik ji ber lexistine dinixumandinş
Jinik dawi 11 herdiwen dtn ziviri:
Candye kal bl heyrani li we dtniheri u bepejn:
- Ger tu tlşteki wilo bikiş em e xebere bişininş em e
bejinş ku tu mexsiis 11 hev tiniş
- Ki guh didin gotlne weş Hun Ji baş dlzanin ku kes
guh nadin peyven weş
Cemdy stiiye xwe xwar kir
- Wiloşşş kes guh nade goUnen meş
96
Lennie qiriya:
- Bila George were virş Bila George were virşş ş
Candy neziki wi bii:
- Meraq mekeş gotş Min denge wan bihistş Ji niha u

deqiqey din we George be nivingeheş
E^ 11 Jina Curley zivtri:
- Ger tu heri mal tu e baş bikiş gotş Ger tu niha heriş
em Ji Curley re nabejin ku tu hatibiiyi virş
Jinike bi nerineke sar ewji seri heta bini di cav re
derbas kirş
- Ez baş ne bawer im ku te tiştek bihisttyeş gotş
Candy:
- Ger tu bi ihttyadi tevbigeriş we baş beş gotş Ger tu ne
emin biş baştir e ku tu xwe nexi taliikekeş
Jinik 11 Lennie ziviri:
- Ez dllşa biimş ku te hebeki Carly şikandiyeş Ji xwe
ew dixuriyaş Car caran ne ku Ji dile min Ji naye da ez wi
bişikinimş Ew di deri re derket u dl taritiya exur de
wanda biiş Gava ew di exur de derbas biiş rişmen hespan
kirin şinginiş hinek heywanan kirin xizinş hinek ji
helkutinş Mina ku Crooks hedi hedi Ji bine ftraxen
xweparastine derdiketş dixuyaş
- Te biska dln got ku yen me hatinş Ma rast e?
- Ji xwe rast eş min dengen wan bihistş
- Min bi xwe tiştek nebihisUyeş
- Deriye bexce hate girtinş Candy gotş Kuro Jina
Curley ciqas zu winda biiş Hebe tune be ew ji Uşten wilo
re pir bi antreman eş
Le Crooks niha nedixwest ku neziki we behse
blbfiyaş
- Ger hun herdu Ji vlr herinş we he baştir blbeş gotş Ez
nlzanlm be ez maylna we ya 11 vtr dixwazlm an na?

97
- Li xweşa min bice neceş dive ku mafe yeki reşik Ji bete riayetkirinş
Canctygot
- Diviyabu we orosplye ew gotinen han Ji te re neklribaş
Crooks rfiye xwe Urş kir:
- Xem nakeş gotş Gava hun hatin 11 vir riinlştln, we reşiktiya min bi mm da jibirkirinş Tişten ku we dlgotin hemii rast mş
Ll exur hespan kirin xlzexiz, rişman kirin şingini, denge qirineke hatş
- Lennie, he Lennie, ma tu U exur i?
Lennie:
- George hat, bi qeiin gotş Ereş Georgeş ez H vir imş
Pişti bistikeke George 11 deve deri xuyabfi ii li der ii dora xwe bekef temaşe kirş
- Tu 11 oda Crooks cl dikiş cl kare te li vir heye?
Crooks tesdiq kir:
- Mln gotş le wan li mln guhdari nekirinş
- Cima te ew neqewlrandin?
Ve care Candy bi lez:
- He George! Min dfivdlrej hesab kirş Ez II hemfi tişti fiklrimş heta em e cawan jl kiroşkan peran Ji qezenc bikinş
Geoijge erza wi şlkand:
- Mln Ji te re negoUbfi ku ve mesele veneke?
Cancfy eceb H ber xwe ket
- Minjl Crooks pe ve jl kesi din re negotiyeş

Geoige got
-Heyde, hfin herdu Ji vir herinş Yaho ma qey ez e nikanibim
deqiqeyeke we bi tene blhellmş Candy fi
Lermie rabfin ser xwe u ber bl deri ve meşiyanş
98
Crooks bang klr:
-Candy!
-He!
- Te bira te, minji te re gotibii ku ez e tevrika baxce
we bikimş karen we yen hfir miir bikim?
Candy:
- Ereş gotş Te bira minş
- We caxe nexwe tu wan gotinan Ji bir bikeş Crooks
gotş Tişten wilo qet nakevin sere minş Min henek
dikirş Ez naxwazlm li ciheki wllo bljimş
Herse peya derketin derdeş Gava ew di exur re derbas
biinş denge helkehelka hespan ii şingina rişman hate
bihistinş
Crookse ku 11 ser nivine xwe runişUbuş deqiqeke du
deqiqan 11 deri niheri, paşe deste xwe direji şiişa xwe
ya zeyte kirş Gomlege xwe Jl paş ve hildajorş hlnek zeyt
berda kefa deste xwe ya pembeş dani ser pişta xwe u firkandş
99
Li quncikeke ftreh ya exur komek gihayen heşin
hebiiş Li ser kome melhevek cgu^ceteU bi ber beştan ve
biiş Ew koma gihaye heya aliye exur e din mina
kendale ciyan dixuya ii Ji bo gihayen ku we he bihatanaş
şiina vala xuya dikirş Li herdu allyan alif hebiin u

seren hespan dl nava şişan de xuya dikirinş
Rojeke yekşeme a pişti nivro biiş Hespen ku behna
xwe berdidan, hiiriken gihaya dawi dldane hevş gevz
didanş dev 11 texten alifen xwe dlkirin u zinciren xwe
diklrin şinginiş Roka pişti nivro di nava qelişteken
diwer re derbasi hundir dibiiş H ser gihe xeleken şewqe
tani holeş Denge vlzina meşcm i bi tembeliş ya pişti
nivro der u dor dadigirtş Ji derve denge peyaye ku bi
nalan dilejristinş dengen nalen wem ku H singen hesini
dlkeUn, dengen wan ku forten hevdu didan fi heneken
xwe bi hevdu dikirinş dihate blhistlnş Li exur Ji
bedengi, tiredi fi germi hebfiş
Ll exurji Lennie pe ve tu kes tune bfiş Lennie Ji, H
cihe ku he ji gihaye nehatibii dagirtinş li ser sindoqeke
ambalajeş li ser gihaye riinlştibfi fi 11 cewrikeki ku li
ber wi bemh direjklri biiş dlniheriş Lennie demeke
direj 11 wi nlheriş paşe desten xwe dlreji wi kir ii ew
mist daş Wi Ji poze cewrlk heya bl dela wi mist daş
100
Lennie hedika ji cewrik re digot:
- Tu e cima bimiri? Tu ne bi qasi mişk bicfik e Jiş
Min tu zede hol nekiribfiş
Wi sere cewrik bilind kirş li niye wi niheri fi got:
- Ger George bibihize ku tu miri yi, ew e destiir nede
ku ez li kiroşkan binlherimş
Wi kortaleke bicfik di bine gihaye de vekir fi cewrik
xisteş Paşe ser cewrik tiji giha kir fi ew veşcirtş Le bele
wi nlkanibii caven xwe Ji tiimikeki biqetandaş xwe bl

xwe got:
-Gelo ez herim xwe di nava hejikan de veşerim? Na
loş ev ne siiceki ewcend mezin eş Qet ne mezin eş Ez e Ji
George re bibejim ku mln ew miri ditiyeş
Wi cewrik derxist meydane u miiayene kirş Ji guhen
wi heya bi delawiş mist daş Bi stiixwciri peyva xwe dom
kirş
- Le cawa be ew e bibihizeş George bi her tlşti dizaneş
Ew e Ji min re bibeJe"Te ev kiriye; tu nikani min
bixapini" we paşe Ji bibeje ku "Ev eş Ji bo ve tu nikemi H
kiroşkan biniheri"ş
E^v bi careke ve hers bii ii denge xwe bilhid kir
- Tu cima dimiri? Tu ne bi qasi mişkeki bicuki Jiş
Wi rahişte cewTik ii dilr avet Pişta xwe daye,
riinişt ii congen xwe billnd kirinş Paşe got:
- Ez e edi li kiroşkan neniherimş We edi George destiir
nede ku ez 11 kiroşkan biniherim"ş
E^vji qehran dihejiyaş
Li derve nalek 11 singe hesini ket, dengeki bilind
hate bihistinş Lennie rabu ser xwe, cii cewrik gmi, dani
ser gihaye, disan riinişts Ji nu ve ew hejrwan mist
da:"Tu he mezin nebiibiiyi" gotş "Cend caran gotinş ku
tu he mezin nebiiyeş Le mln nlzanibii tu e evqas zii
101
bimiri"ş
Wi tiliyen xwe dani ser guhen cewrik en qermici:
- Belkiji ne xema George beş gotş George Ji vi cenabe
pis hez nedikirş

Jina Curley 11 quncika dawlye xuya buş Ew wilo bi
hedika nezik biiş ku Lennie hatina we qet ferq nekirş
Kincen we yen Ji pemboş yen bi rengen xav le biin ii
solen we yen bi periken heştirman xemilandiş di
lingen we de biinş Riiye we boyeixkiri buş pore we weke
her car lihevbadayi biiş Gava Lennie sere xwe bllind
klr ii 11 we niheriş dit ku ew glhiştiye ba wiş Lennie tirsiya
ii hema hemezeke giha avete ser cevmkş Bi riiyeki
dallqandi H Jinike niheriş
- Eiw e 11 wir ci ye ezize mln? got
Lennie bl sert le niheri:
- George naxwaze mln bl te re bibineş Ji min re
dibeje, ne bi we re bipej^ve fi ne ji Uşteki blkeş
Jlnik keniya:
- Ma her tim George ji te re dibeje be tu e ci biki fi ci
nekiş
Lennie 11 koma gihaye niheri:
- Ger ez bi te re bipejivimş ew e nehele ku ez li
kiroşkan biniherimş
Jlnike bl dengeki nizim got:
- Ew ditirse ku we Curley hers bibe, loma ew naxwazeş
Le nlha mlle Curley giredajri yeş Ger Curley bela xwe
di te blde, tu e mlle wi ye dln Ji wilo bikiş Ji te weye ku
ez bi we makina derewan dlxapim?
Lennle qet neziki we nedibfi:
- Na, naş ez naxwazlm bl te re bipeyivimş
Jinik II ser giha 11 ba wi, 11 ser tfitlkem runlştş
- Ll min guhdari blke, gotş Hemu niha bl listika nale

102
dileylzinş Saet he car eş Eiw nlha xajizi listike biineş
Kesji wan bi ciheki de naceş Cima em Ji xwe re riinenen
fi nepeyivln? Keseki ku ez pe re runem ii bipejivim tune
yeş Ezji tenettye mehfi biimeş
Lennie got:
- Na ez nikanhn bi te re bipejnvimş
Jinlk:
- Tenettye mala min weran klriyeş E te, tu dlkari bl
heveden xwe re bipeyiviş Le e min Ji Curley pe ve keseki
ku ez blkaribim pe re bipeyivim tune yeş Ger ez bl yeki
din re blpejivim ew hers dibeş Ger tu bi ii tu bi kesi re
nepeylvi ma tu e debar biki?
- Ji bo min peyva bl te re qedexe yeş George diUrse ku
belayek were sere minş
Jinike gotin guhert:
- Ew ciye ku te 11 wir nixumemdiye?
Lennie bi careke ve hemii xemen xwe bi bir emiş Bl
xemgini got:
- E^v cewrike min eş Ma we ci bibe, cewrike min eş
Bi desteki we gihaya ku pe cewrik nixumandibii da
aliş
-Aa! Ewmirtye!
Lennie:
- Ew wilo biciik bu kuş gotş Me bi hev re dilejristş
Wi xwest min bi henekan gez blkeş Min Ji bi henekan
lexist ii ew hema mlrş
Jlnike ew teseli kir:

- Tu ci 11 ber dikevi? Cewrikeki kficlka ye, ma we cl
bibeş Peydakirina cewrikeki din ne ewcend zehmet eş
Her der tije cewriken kficlkan eş
Lennie bi dengeki kederan got:
-Ne ewqasi, got, le esil ew e niha George destfir nede
103
ku edi ez H kiroşkan Ji biniherimş
- Cima ew e destfir nede?
- Ji ber ku wi ji min re goUbii, ger tu careke dhi xerabiyeke
bikiş ez hew te li ber kiroşkan dihelimş
Jinik neziki wi buş bi dengeki xwepeşerinklrini got:
- Ji peyivandina bi min re netirseş gotş Guhdari
bikeş hemii kes 11 derve diqijin ii qerebalixe dikinş Ye
ku di ve lisUke de bi ser bikeveş car dollaran qezenc
dikeşşş Heta lisUk neqede ew nikarin bi ciheki ve
herinş
Lennie bi zimaneki ihtiyadi got:
- Ger George bibine ez bi te re dipej^vimş ew e erza
min bişikineş gotş Wi ez şiret klrime da ez bi te re nepeyivimş
Jinlk hers bii:
- Baş eş le ma min xerabi bi ke klriye? Ma qey heqe
mln tune ye ku ez bi peyaki re du gotlnan bikim? Ew
mln ci dizaninş cane min ? Tu lawlkeki bedeng iş Ma ez
bl te re bipeyivim we ci bibe? Ez xerabiyeke nakim kuş
- Goeige dibeje ku tu e sere me texi belayeş
- Ew ji goUn eş ma ez e kariblm ci xerabiye bi te
blkim? Jiyana ku ez li vir dijim bala kesi nakişineş Ez
ne layiqe ve jiyane meş le ma ez e ci bikimş Ez

dlkaribfim bl hesani bibiima yeka navdarş(We bi
dengeki bi keder dom kir) Dibe ku Ji ez dl peşeroje de
bibim yeka navdarş
Paşe bi tlrsa ku we hinek guhdare we ji we bistine,
we dile xwe vekir, bi hewcedariya rijandlna derdş bi
derbeke hundlre xwe vala klr:"Ez 11 Salinese
riidiniştlmş Gava ez Jl wir hatlmş ez cenlkek biimş
Rojeke komeke tlyatroye hate bajerş Min aktorek nas
klrş Wi ji min re gotş ger tu blxwazi tu Ji dlkani tekevi
104
nava koma meş Le dlya min destiir nedaş Jl mln re gotş
tu he panzdeh sali yiş Merik gotibu Uşt nabeş cedibeş
Ger min peşniyara wan qebiil kiribfiyaş we niha Jiyana
min pir xweş buyaş
Lennie cewrik mlst dida:
- Em e ciftlikeke bicuk bikirinşşş We kiroşken me
cebibinş
Jinike ftrsend neda wi ku ew peyva xwe bidomineş
zfi bi zfi behsa jiyana xwe domand:
- Min careke dinji sinemavanek nas klrş Min li Riversiye
li Dance Palacee pe re dans Ji kirşWi jl min re
got ku ew e min bike artista sinemayeş Ji min re gotş tu
artist hatiyi dinyayeş Cer ku ew vegeriya Hollywoode
wi e ji min re binivisandaş
Ji bo ew fer bibe ka ew tesire li Lermie dike an naş we
ji nezik de H Lennie niheriş
- Min ew name negirtş gotş Muheqeq name ketiye
desten diya mlnş Ez her diftkirim ku we ew name

winda kiriyeş Yan wek tu fehm dikiş ez e nebuma
tiştek, ez e ne 11 ciheki navdar bumaş di ser re Ji ez
nikanibum li ciheki geni ye ku nameyen min le diha-
Un dizinş bimamaş Min Ji we re gotş ma te nameyen
min dizi ne? We gotş naş Ji ber ve yeke ez bi Curley re
zewicimş Min ew we şeve 11 Riversiyeş 11 Dance Palacee
ditibuş Tu li Uşte ku ez dibejim guhdari diki?
- Ez? Ere!
- Min heya iro ev Jl kesi re behs nekirineş Belkiji divlyabu
min qet behs nekiraş Ezji Curley hez nakim,
ew ne mlroveki qenc eş
Ji ber ku we Uşten di dlle xwe de Jl wi re rijandibunş
ew neziki wi bfi, li cem riinişts
-Ez dikaribfim bibiima artista sinemayeş mln
105
dikamibii kincen spehi 11 xwe bikiraş eyni klncen mina
yen wan spehiş Ez e li wan hotelen mezin bimamaş wan
e resime min bikişandinaş Gava wan evara peşi filme
min nişan bidanaş ez e di radyoye de bipeyiviyamaş
min qumşek xerc nediklrş Ji ber ku we artista film ez
biimaş Min eyni mina wan kincen xweşik 11 xwe
bikiraş Merlk Ji min re gotibiiş "tu artist hatiyi
dinyaye"ş
We bere xwe bi Lennie vekir ii Ji bo nişan bide ku ew
dikare di ftlman de bilej^eş bi dest ii milen xwe tevgeriyaş
Tiliya we ya qeraqiicke ber bi zende we ve hatibu
zivirandinş
Lennie behneke kiir girtş Ji derve nalek li singe

hesini ket ii kire cinginiş Dengen şabaşan bilind bunş
jma Curley:
-Hebe tune be yeki nal derbasi darike hesini kirş gotş
Her ku roj dadiket, şewq dihate guhertin, tava roje
diwar derbas dikir ii digihişte ser seren hespan ii
aHfen wanş
Lennie got:
- Ger ez vi kiiclki bibim biavejim derş dibe ku George
qet ferq nekeş We caxe we kes nlkaribe Ji niherina min
ya kiroşkan re blbe astengş
Jina Curley eceb hers bu:
- Ma qey tu Jl kiroşkan pe ve li tlşteki din naftkiri?
Lennie bl sebir dom kir:
- Evf e clfUlkeke me ya blciik ceblbeş E)w e maleke meş
bexceyeki me cebibeş E^v e erdeki me ye nefele ceblbeş
Em e nefele Ji bo kiroşkan blcininş ez e cewaleki bigirlm,
tlje nefel biklm, paşe ez e ji kiroşkan re binimş
Jinike Je pirsi:
- Cima tu evqasiji kiroşkan hez diki?
106
Jl bo Lennie bikaribe bigihije bliyareke ew diir u direj
ftklriş Paşe xwe nezikijinike kirş
- Mistdana tişten spehi li xweşa min diceş gotş Min
rojeke 11 mazate kiroşken plrcdirej ditinş Ew ciqas
xweşik biinş Gava ez tişteki din ye mistdane nebinimş
ez cama mişkan Ji mist didimş
Jina Curley hebeki Ji wi vekişiya:
- Qey tu dehn i?

Lennie bi cidi got:
- Naş ez ne dehn imş George Ji min re dibeje tu ne dehn iş Ez hez dikimş ku ez tişten xweşikş tişten nermik bi tiliyen xwe mist bidimş
Tirsajinlke hebeki daketibiiş
- Her kesje hez dikeş gotş Her kes hez dikeş Ez 11 ser destdana hevreşim u qedife dehn dibimş Ma tu dixwazi dest qedife bidi?
Lennieji kefan hol biiş bi dilşahi qiriya:
- Tu ci dibejiş min percek qedife Ji bi xwe re digeremdş Jinikeke ew perceye qedife dabu minş ew Jinik xaltika min biiyeş Ha perceki wrilo dabu minş Axş ger ew qedife niha bi min re biiyaşşş!
Xemgini dawerivi riiye wiş
- Min ew winda klrş gotş Mm ewji mej ve neditiyeş
Jlna Curley heneke xwe bi wi klr:
- Tu dehn iş gotş Le tu zarokeki bedeng iş Tu eyni mina zarokeki mezin iş Le mirov fehm dlke be tu dlxwazi cl blbejiş Gava ez cama pore xwe dişkinimş ez pore xwe mist didimş ew weke qedife yeş
Ji bo ku ew mistdana pore xwe nişani wi bideş we tlliyen xwe di nava pore xwe rakirinş
- Pore hinekan qalind ii sert eş gotş Ser qiseş ye Curley wilo yeş Pore wi eyni mina stiriyan eş Le pore
107
min zlrav il mina qedife nermik eş Ji ber ku ez hertim dişkinimş loma ew wilo nermik eş Ka tu deste xwe bide virş teim virş

We bi deste Lennie girt ii dcmi ser sere xweş
- Deste xwe dejme vir ii le bigerineş binere be ciqas nermik eş
Lennie bi tiliyen xwe yen mezin pore Jinike mist daş
- Le pore min xerab nekeş
Lermieş
- Oxş ci xweş e! gotş Wi he bi heztir mist daş - Ox ci xweşe!
- Bala xwe bideş tu şikle pore min xerab dikiş
Paşe bi hers qiriya:
- Bes eş tu e pore min Ji hev de bixiniş
We bi tevgereke xurt sere xwe zivirandş Lennie
Uliyen xwe H hev şidandin ii pore we bemedaş
Jinik:
- Min berdeş bi qerin gotş Ezji te re dibejim min berdeş
Mina dehnan li Lennie hatibiiş Riiye wi şirki biibiiş
Jinike dest bi qirine klrş Lennie bi deste xwe ye din dev ii poze Jinike girtş
- Ji bo Xwede megiriş wi bi bergerin gotş Ji bo Xwede megiriş George bibihize we bixeyideş
Jinik bi şldet dl nava lepen wi de perpitiş Bi herdu lingen xwe li gihaye xistş bi heviya ku ew e xelas bibe, ew vedigeviziş Lennle Jiji tirsem dest bi qirine kirş
- Ji bo Xwede meke! bi bergerin gotş We disan George Ji min re bibeje, ku min xerabi kiriyeş Paşe ew e destur nede ku ez 11 kiroşkan biniherimş
Gava Lennie hebeki deste xwe sist kir, Jinlke bi

dengeki keti klre qirinş Lermie Ji we yeka han hers biiş
108
- Bes e, ediş gotş Wilo meqireş Mina ku George goUye tu
e sere min texi belayeş Tişten wilo mekeş
Caven Jinlke beloq biibiinş we bi wi awayi li ber xwe
didaş We caxe Lennie ew hejandş ew eceb hers buş Bi
ledan:
- Wilo meqireş gotş
Laşejinike mina masiyeki 11 erde direj buş paşe ew
qet tevneliviyaş Lennie hestiye stuye we şikandibiiş
Lennie 11 Jinike niheriş bi ihtiyad deste xwe ji ber
deve we hilemi; Jinik disan tevneliviyaş
- Ez naxwazim xerabiyeke bi te bikimş wi gotş Le ger
tu wilo biki qirinş we George eceb hers bibeş
Gavajinike bersiv neda u hew xwe tevlivandş Lennie
xwe baş bi ser we de tewandş Wi mile we bilind kir ii ew
berdaş E^ demeke şaş buş Paşe bi tirs pirsi:
- Min xerabiyek kirş Min careke din xerabi kirş
Bi qasi ku ew qismekiji Jinike bintxumineş wi giha
avete ser weş
Ji derve dengen peyem u dengen ledana du nalan
hatin bihistinş Lennie Ji nu ve bi hebiina miroven 11
der diheslyaş Wi xwe li ser giha direj kirş lingen xwe
kişandin zike xwe ii behna xwe berdaş
- Min tişteki pir xerab kir, gotş Gerek min ev nekiribaş
we George hers bibeş Wi Ji min re gotibu kuşşş Ji min
re gotibuş heya ku ez werim tu xwe dl nava deviyan de
veşereş E^v e ntha hers bibeş Wi gotibii, heya ku ez werim

tu di nava deviyan de bimineş
Lennie disan 11 jinika miri niheriş Cevmke miriji li
hlndajinike direjkiri biiş Lennie rahişte cewrikş
- Ez e vi biavejim, wi gotş Ev ji miiye xwe gij dtkeş
Wi cewrik xlste bin Ccdiete xweş heta bi diware exur
bi qiinkişke cii ii ji qelişteka texteki 11 listikveman
109
niheriş Paşe ew di ba alife heri dawi reş hedika derket u
windabuş
Tava roje niha gihiştibii ser qisme diwer ye heri
bilindş şewqa li exur sivik dibiiş Jina Curley li ser pişte
direjkiri bii ii nive we bi gihaye hatibfi nixumandinş
Ll exur bedengiyeke mezin hebfiş Li clftlike
bedengiya pişti nivro hukum dikirş Dengen cinginiya
nalan ii dengen peyayen ku bi nalan dilej^stin Ji sivik
dibuş Digel ku li derve he mina roje biiş hundure exur
hedi hedi tari dibiiş Kevokek di deriye Ji bo kişandina
kayere ku 11 ser pişte vekiri buş kete hundurş Pişti ku
ew careke di hundur de ziviriş ew disan derketş
Kficikeki şivanan li dawiya exur xuya bfiş Ew delikek
zirav u direj buş guhanen we pe ve daliqyayibfinş Gava
ew ber bi sindoqa ku cewriken we te de biin ve cu, behna
terme jina Curley ciiyeş Ji ber we behne pirca we le gij
biiş We dengin zirav derxistin fi kire niizinş Paşe ew
neziki smdoqe bu u xwe avete ba cewriken xweş
Jina Curley bi rewşeke ku nive we bi gihaya zer wllo
nixumandi biiş direjkiri biiş Edi di riiye we de esereke
ku ji beciriyeş Ji hisen entrikayi, Ji kinen ku we Ji

tenetiya xwe his dikir, nema biiş Ew pir xweşik u pir
sade bii, riiye we şerin ii ciwan biiş Hlnariken we yen podrakiri
u leven we yen boyaxkiri rewşa miroveke bi
mh didaye, mina ku ew di xeweke sivik de be dixuyaş
Guliken we yen blciicik mina marmarokan di paş sere
we de 11 ser gihaye belav bubii, leven we Ji hev mabiinş
Mina ku cama dibeş deqiqe dlrej bfinş ji deqiqan Ji
he direjtlr ajotş Cend deqiqeyen ku ji deqiqan plr
direjtirş hemfi deng rawestiyanş tu tişt tevneliviyaş
Dem hedi hedi şiyar bii fi bi tirgJi gera xwe domandş
Li aliye alifan yen din, hespan pehin avetin, zlnciran
110
kirin şinginiş Dengen zilamen li derve he blHndtir ii he
vekiritir hate bihistinş Li aliye exur ye dawiye denge
Candye kal hat:
- Lennie! Lawo Lennie! Ma tu li wir i ? Min hesibandş
Biner, ez e Ji te re bejimş be em e ci bikin ?
Cemdye kal li quncika dawi ya exur xuya buş
- He Lennie, disan wi bang kirş
Paşe ew sekini fi veciniqiş Mile xwe ye qop II ser ruye
xwe ye bi rih gerandş Ji Jina Curley re:
- Mui nlzanibii tu li vir bfi yi, gotş
Gava be bersiv ma, nezik biiş peklya ser we:
- Razana te ya li virş ne di cih de yeş
Pişti kelikeke ew hatibfi ba Jinike "Wey lawo!" gotş
Riha xwe xurand ii bi şaşmayi 11 dora xwe niheriş Paşe
ewji cihe xwe pengizi u derket derş
Axur edi hişyar bfibiiş Hespan behna xwe digirtin ii

berdidan, pehin davetin, kaya di alifan de dtxwarinş
rişmen xwe yen zinciri diklrin şinginiş Pişti kurtedemeke
Candy bi George re vegeriyaş
George pirsi:
- Tu Ji min ci dixwazi?
Candyjtna Curley nişan daş George pirsi:
- Ci bi we hattye?
Ew neziki we bfiş Paşe wi gotina Curley ducare
kir"Wey lawo!" Ew li ba Jinike 11 ser tuUkan runiştş
Deste xwe dani ser dile weş Gava ew hedi hedi ii bl
zehmetiji clhe xwe rabiiş rilye wi bfibu mina textekiş
sert diniheriş
Curleyje pirsi:
- Gelo ke ev yeka han klrtye?
George bi nerineke sar 11 wi nlheri:
- Ma te fehm nekiriye?
1 1 1
Candy deng neklrş Georgee ku şaş mabii we ci bikira,
- Dlviyabii min ev texmin blkiraş gotş Ki dtzane,
belkiji min di dile xwe de kiribeş
Candy ptrsi:
- Em e niha ci bikln George? Em e ci bikin?
George demeke direj bersiv nedaş
- Herhalşşş dive emşşş Ji yen din re bibejinş Dive em
lewik bigirin fi bavejin hevseş Dive em destur nedin ku
ew baz bideş Ehmaqe rebenş we Ji bircina bimireş
Wi xwest ku ew xemgintya xwe haş bike:
- Ger em wi bavejin hevseş dibe ku ew muamela

xerab bi wi nekinş
Candy bi dengeki bl heyecan got:
- Dive em nehelin ew baz bideş Tu Curley nas nakiş
Curley de wi linc bikeş Curley de wi blde kuştinş
George 11 deve Csmdy diniheriş Dawi:
- Ereş gotş Tu rast dibejiş Curley de wi bide kuşthiş Ye
din Ji de we yeke bixwazinş
Wi careke din ji H Jina Curley niheriş We caxe Candy
tirsa xwe ya heri mezln vekir:
- Ma ez ii tu nikanin we ciftlika bicfik biklrin
George, ha tu ci dibeji George? Ha tu ci dibeji?
Bei ku Candy H bendi bersiva George raweste, wi
sere xwe tewand fi li gihaye niheriş Wi fehm kiribfiş
George bi hedika:
- Ji xwe min dizanibii, gotş Min dizanibu ku em e
nebin xwediye we clftlikeş Lebele guhdarikirina li
gotinen te ewqasi li xweşa mtn ciibiiş ku dawi dawi mln
Jiji ve xeyale bawer klribfiş
Candy bi awayeki xemgin got:
- Demek ev kar hew dibe, ne wilo?
Mina ku George denge wi nebihisUbeş got:
112
- Ez e meha xwe biqedinimş penci dollaren xwe
bistinim fi 11 kerxaneyeke pis hetani sibehe biminimş
An Ji ez e herim meyxaneyeke ii heta ku ez bi tena sere
xwe biminimş ez e vexwlmş Paşe ez e werim meheke dHi
Ji bixebitimş ez e penci dollaren dln ji qezenc bikimş
Candy got

- Ew ci lawikeki baş bfiş Qet nedihate bira min ku ew
e tişteki wilo bikeş
George caven xwe Ji Jina Curley venediqetandinş
- Lennie ev yeka han Ji xerabiyeke nekiriyeş Kar ii
işe wi ew e ku ew karen be mane bikeş Le ew ne Ji xerabi
dikeş
Rabii ii H Candy ziviri:
- Niha tu H min guhdari bikeş Em herin haya yen
din bigihinineş Dive em lewik bigirin ii binin virş Tu
careyeke din tune yeş Em wilo bikin da ew xerabiyeke
bi wi nekinş
Bi nerineke kurt ii bi biryar bi ser ve zede kir "Ez
destur nadim ku ew dest Lennie bidinş Niha tu li min
guhdari blkeş Belki yen din texmin bikln ku tiliya min
Ji di vi kari de heyeş Ez e herim oda meş Tu pişti
deqiqeyek dm derkeve der ii haya yen din bigihineş ez e
Ji werimş mina ku ez cara peşi dibinim ez e tevbigerimş
Tu e ve blki, ne wilo? Ew e bi vi awayi tebigihen ku di
ve yeka han de suce min tuneyc
Cancty got:
- Ere Geoi]geş ez eji dil btkimş
- Baş e we caxe, tu deh deqiqan destiir blde mlnş Paşe
tu bl lez ii bez derekeve u beje ku te jinik niha diUyeş Ez
dicimş
George bl lezji exur derketş Candye kal ji paş ve li wi
niheriş Paşe wi bl şaşmajn caven xwe ber bi Jinlke ve
113
zivirandmş Kul ii hersa wi hedi hedi zede biiş bi awaye

gotine ji deve wi rijiya:
- Hey keca qehpeş gotş tu dixuriyajnş dawi te bela xwe
ditş Herhal ntha kefa te li cih eş Her kesi zanibu ku tu e
neliretiyeke bikiş Ji xwe tu ne yeke bi esil buyiş Edi tu
ne hejayi tu giiji yiş keca berazanş
Wi behna xwe di poze xwe de girt ii berdaş denge wi
leriziş
- Min e gihaya 11 bexce bida hev u firaixen te
bişuştanaş
E^v sekiniş disan gotş Wi gotinen xwe yen bere duceire
diklrinş
- Ger canbazxaneyek bihataş bi basketbole bihata
lejrisUnşşş em e biciina wirşşş Bi teneş guh mede karş me e
bigotaş em e derketlna ii bicunaş Me e hesab nedaya
kesiş Ew e berazen meş mirişken me cebibiinaşşş Gava
zlvistan bihataşşş em e H wir bi reheti riiniştanaş"
Caven wi tiji hesir biibiinş ew ziviriş bi desten xwe ye
qop riha xwe ya gij xurand ii ji exur derketş
Li derve denge listike hate birinş Denge mirovan
biltnd dihatş wan munaqeşe dikirinş Paşe dengen bcizdana
lingan hate bihistinş Axur tiji zilam bubiiş Slimş
Carlsonş Whitş Curley xuya kirinş Ji bo ku Crooks bale
neklşineş ew 11 dawiya wan biiş Cemdy li peşiya wan
dimeşiyaş George cakete xwe ye şin 11 xwe kiribii ii
blşkoken wi girUbun ii şewqe xwe ye reş bera ser caven
xwe dabiiş Zilam bi bazdan di dawiya exur de derbas
biinş Di taritiya spede caven wan 11 Jina Curley ketinş
E^v seklninş mina kevlran di cihen xwe de sar man ii 11

we niherinş
Slim bi hedika neziki we bii ii deste xwe dani ser rehjana
weş Tillyen xwe yen zirav bi hinariken we klrinş
1 14
paşe deste xwe xiste bin sere we ye ku hebeki xwar biibilş
wi paş stiiye we muayene kirş Gava ew rabu ser xweş ew
peyayen li wirş 11 dora wi civiyan ii ew bedengiya ku
hebu xerab buş
Curley bi careke ve mh pe ve hatibu:
- Ez dizanim be ke ev yeka han kiriyeş Wi nerehespe
girs ev kiriyeş Muheqeq wi kiriyeş Ev yeka hcm be şik
eş Ji ber ku yen din hemuyan li derve dilejnstin
Her ku dicii hersa wi zedeUr dibfiş
- Ez e wi bikujimş Ez e herim tivinga xwe binim fi wi
bikujimş Ez e wi lawe qehpe bi desten xwe bikujimş Ez e
reviye wi biqeleşimş Heyde zarono, werin!
E)w bi hari ii bi bazdan Ji exur derketş Carlson got:
- Ez herim demanca xwe binimş
E^vji bi rev cfiş
Slim bi hedika 11 George ziviri:
- Xuya ye bi rasti Lennie ev yeka han kiriye, gotş
Stuye Jinike şikesti yeş Ji Lennie pe ve kes ve yeka han
nakeş
George bersiv neda, bi hedika sere xwe tewandş
şewqe wi ewqasi dakete ser caven wi ku, herdu cav di
bini de winda bunş
Slim dom kir:
- Dibe ku mina we biiyera 11 Weede, ya ku te behs

kiribu, bfiyeş
George disan bi sere xwe tesdiq kirş
Slim axinek klşand:
- Herhal dive em wi bigirinş Tu dibe ew e ciibe ku?
George demeke direj gotinekji negotş
- Eşşş ew dive ber bi başfir ve cube, gotş Em ji bakur
hattneş Ji ber ve yeke ew e ber bi başfir ve cfibeş
Slim:
1 15
- Herhal dive ew bete girtin, disan gotş
George neziki wi bfi:
- Gelo mirov nikane lewik bine vir ii wi li vir bide
girtin? Hişe wi ne II sere wi ye, Slimş Wi ne bi armanceke
xerab ev kiriyeş
Slim tesdiq klr:
- Belki em bikanibinş gotş Ger em bikanibin Ji derketina
Curley re bibine astengş dibeş Le we Curley bixwaze
ku wi bikuJeşKina Curley H hemberi wi heyeş Hem
ferz blke ku wan lawik girtinş ew giredan u avetin
hevseş Ev ne Uşteki xweş eş Georgeş
Carlson bi bazdan hat:
- Lawe qehpe demanca min dizi ye, bi qerin gotş Min
cente xwe ji neditş
Curley li dii wi dlhatş Di deste Curley ye saxlem de tivingek
hebuş Curley haş biibiiş
-Ma hiin hazir inş zarono? Tivingeke ye reşik heye,
tu rahije we Carlsonş Ger te ew girt diqet bike, ew disan
baz nedeş Gulleke bera zlke wi bideş Bila ew benamiis

bibe du qet
Whlte bl awayeki pir bi heyecan:
- Tivtnga min tuneye, gotş
Cuiley gotş
- Muawine Sherlf Al Wlst bineş Heyde bimeşinş
Bi nerineke bi şik 11 George ziviri:
- Tu e Ji bi me re weri?
George:
-Ere, gotş Ez e bemş Le tu 11 min guhdari bike Curleyş
E^v rebenş dehnik eş Kuştlna wi ne rast eş Ew nizane be
ew cl dikeş
- Te got kuştina wi ne rast e? Curley Je pirsiş Wi
demanca Ceirlson Ji dizi yeş Em e wi wilo bikujin kuş
116
George bi hedika 11 dij derket:
- Belki Carlson dememca xwe winda klribeş
- He ew ve sibehe H cihe xwe buş Carlson gotş
- Naş naş demanca mm nehatiye dizinş
Slim H Jina Curley dlniheriş wi got:
- Curleyşşş Minasibtlr e ku tu li ba Jinike biminiş
Curley spisor bfi:
- Ez e herim, gotş Ez e wi benamfisi bi desten xwe bikujimş
Ger desteki min nexebite Ji xem nakeş Ez e wi
lawe qehpe bikujimş
Slim 11 Candy ziviri:
- Cemdy, we caxe tu li ba term bimineş Dlve em tavile
derkevinş
Ew ketin reş George demeke 11 ba Candy rawestlya,

wan bi hev re li Jinika miri temaşe kirinş
Curley got:
- He George, tu Ji bi me re were, da em btzanibin ku
Uliya te ji di vi kari de tune yeş
George hedi hedi di peşiya wi de meşiya, llngen xwe
li dfi xwe dikişkişandinş PişU ku ew derkeUn, Candy H
ser gihe riinişts Li ruye jma Curley niheriş Bi hedika:
- Lawike reben! got
Denge peyan wtnda bfiş Her ku dicu hundure exur
taritir dibiiş Heywanan 11 beşe xwe gevz didan, rişmen
wan dikirin şinginiş Candye kal xwe 11 ser glhe dlrej
kir, bi milen xwe caven xwe gtrtinş
117
Dawiya we nivroyeş ava ceme Salinase kfirş bedeng ii
keskş mina ku razayi biiş dixuyaş RoJ edi Ji geli
vekişiya bii ii bi pişta ciyayen Gabilane ve radipelikiş
Clyayen bilind Ji roje sor bubiinş Lebele li keleka ava
bedengş di nava daren cinaran en pitikpitiki de
nivtaritiyeke hukum dikirş Mareki avi hedi bi nava
ave de dlciiş Sere wi mina periskopeke biciik vir de ii we
de li ba dibiiş ew Ji ava bedeng derbas bii ii li cihe ava
nizlmş xwe avete nava pencen ciikeki masixwlrş Seri ii
nikuleki bei qerebaltx ew mar girtş nikul mar Ji aliye
seri ve daqurtandş teriya ku li derve mabiiş 11 ba dibiiş
Ji diir ve tofanek rabii, be mina peleke li seren
darem xistş Pelen daren cinaran berevaji biinş helen
wan yen zivini xuya biinş Pelen hişk yen li erde cend
metreyan li ba bunş Baye sivik riiye ava kesk cend

caran 11 ser hev qurmucandş Mina zu destpekirina
xwe, wlsan Ji zu dawi hatş der u dor disan bedeng bfiş
Cfike masixwlr bei ku xwe tevblHvineş ew rawestiya
biiş Mareki din e biciikş periskopa xwe ya bicfik vir de ii
we de diziviremd ii ber bi Jor ve ayjeni dlklrş
Lermie bi careke ve Jl nava erde beyar derketş Ew
mina heyveke ku diklşiya, bedeng dimeşiyaş Cuka
masixwlr basken xwe II hev xlsUn, paşe bi rabfineke re
jl ave derketş di ser cem re firiya ii ciiş Mare biciik di
118
nava qamişe di rex cem de winda buş
Lennie hedi hedi neziki keleka cem biiş Li ser congen
xwe riiniştş xwe bi ser ave de tewsmd ii hedi hedi av
vexwarş Gava şaxen 11 pişt wi Jl ber ciikeke bicuk kire
qirciniş wi bi caireke ve sere xwe rakirş caven xwe vekirin
fi guhen xwe pel kirinş Gava ew cav li cuke ketş wi
diScm sere xwe tewand fi vexwEirina xwe dom kirş Pişti
ku wi ter av vexwairş Ji bo ku ew bikaribe re gişi blbineş
wi xwe li ser kelekeş 11 rex cem direj kirş Wi bi herdu
desten xwe congen xwe kişandin jore u cenga xwe xlste
nava herdu congen xweş
Ronahiya ku Ji geli bi dur diket fi hedi hedi belav
dibfiş sere gir fi ciyam dibiriq•’mdinş
Lennie hedika got:
- Ma ez hic Ji bir dikimş Ez e xwe di nava deviyan de
veşerim u li bendi George rawestimş
Wi şewqe xwe bi ser cave xwe de xwar kirş
- We George erza min bişikineş gotş We niha George

bibejeş ger ne Ji te biiya min e ji xwe re ci reheti bikiraş
Wi sere xwe zivirand u H sere ciyayen bi şewq niheri:
- Ez dikarim herim wlr ii Ji xwe re 11 şikefteke bigerimş-
Paşe bi xemgini dom kir- Ez e careke din ava ftringiyem
nebinimş le xem ncdceş Ger George mln nexwazeşşş
Ez e herimş ez e bidim re ii herimş
We caxe di sere Lermie de Jinikeke qelewş hurik il pir
peyda biibiiş Bercavkeke cemiqalind li ber caven we biin
ii peşmaleke bi berik li ber we biiş Jinik di rewşeke
pakij ii bi rek ii pek de biiş We desten xwe danibun ser
kulimeken xweş li ba Lennie rawestiyabiiş av^riren xwe
tiij kiribiin u 11 Lennle diniheriş Gava we deve xwe
vekirş ew bi denge Lennie pejivi:
- Min Ji te re cend carem gotiyeş cend caranşşş Li
119
gotinen min guhdari bikeş George lawikeki biaqll eş
hemji ew ji te pir hez dikeş Le qet ne xema te yeş tu her
Uşten xerab dikiş
Lermie bersiv da:
- Min pir hewl daş xaltiya Claraş Ger tu bizanibi be
min clqasi hewl dayeş Leji desten min naye haşşş
Jinike disan bi denge Lermie dom kln
- Tu qet 11 George nafikiriş Tişte ku lewik ji bo te neklribe
nemayeş Ger percak pasta tekeve deste wiş ew e
nivi Je bide teş hem ji ew e nive pir blde teş Ger ew ava ftringlyan
peyda bikeş ew e bixwaze ku hemujn bide teş
Lermle stiiye xwe xwar kln
- Ez dizanimş min geleki hewl dayeş xaltlya

ClaraşşşTu nizani be min ciqasi xiret klriyeşşş
Jmike peyva wi blrri:
- Ger tu ne H ba wi biiya ew e ciqasi rehet biiya ew e hemii peren wiji wi re bimayaş ew e bikariba Ji xwe re blciiya kerxane kef biklraş an Ji ew e bikariba ji xwe re bi bilardo blleyistaş Le nlha dtve ew bi te re mijul bibeş
Jl kerban Lennie bl nalin got:
- Ew e ciijana mln Ji min re bixertir beş Cawa be ew e George hew blhele ez 11 kiroşkan mlqate bimş
Xaltiya Clara wrlnda bii, dl sere Leimie de kiroşkeke mezln cebuş Kiroşk derbasi hemberi wi bii, riinişt fi dev u poze xwe tevllvandinş Ewji bl denge Lennie peylvi:
- We H kiroşkan blneref Bala xwe bldln vi ehmaqiş
Tu nabi neyniika wanş Tu e wan Jl bir blki, wan Jl bircina bldi kuştlnş Hemii Uşte ku tu blki ev eş We paşe George ji te re nebeje cl?
Lermle bi dengeki bilHidş
- Na ezjl bir naklmş gotş
- Ji bir nakeş Ll piinga ku dlxwe btnereş Kuro tu ci yi?
120
Xwede zane Jl bo ku George te Jl cem xelas blkeş Uşte Ji deste wi hatiye wi klriye; le bi keri ci hat? Maji te weye we George destfir blde ku tu 11 kiroşkan binere? Aqile te! Ew di heyate te naheleş Ew e tera xwe li te bixeş te fehm kirş doqo?
Ve care Lermie hers bii:
- Ew qet Uşteki wllo nakeş George tlşteki wllo bi min nakeş Ez George naşşş ez wi Ji zfi ve nas dikimşşş Wi qet

deste xwe H min bilind nekiriyeş Ewji mln hez dikeş ew nikane xerabiye bi min bikeş
- Rast eş le edi ew iif biiyeş We te baş biheşlne, paşeji ew e devji te berde ii hereş
Lennie mina dehnan qiriya:
- Naş naş ew tişten wilo nakeş Ez George nas dikimş Em herdu her bi hev re gertyaneş
Le kiroşke hedika eyni goUnen xwe dubare klrinş
- Ew e te bihele fi hereş beaqile girsş Ew e te bihele u hereş beaqile girsş
Lennie bi herdu desten xwe guhen xwe girUnş
- Naş na! bi qerin gotş Axş George!şşş George!şşş Geoige!şşş
George bedengji nava deviyan derket kiroşkji kete sere Lennle ii xwe veşartş
George bl bedengi je plrsi:
- Tu cima evqas diqiri?
Lennie 11 ser congen xwe rfinlştş
- Tu e min bi tene neheli ne wHo George? Ez dizanlm tu min bi tene naheliş
Geoiige bl gaven bi lez neziki wi bii ii II ba wri riinlştş
-Na
Lennle:
- Min dizanibfiş bl denge billnd gotş Min dizanibfi tu
121
ne peyaki wilo yiş
Geoige deng nekir
-Ciye?

- Tu e bi min re parve neki?
- Parvekirin?
- Ereş weke her carş canoş Te ditş tu ci dibeji: "Tu ne li ba min biiya, min e penc dollaren xwe bistandaşşş"
- Kuro tu ci peyayiş Lennie! Tiştekji bfiyeren ku biine nayen bira te, le hemu gotinen ku Ji deve te derdikevin tene bira teş
- Ma tu e wan gothiem nebeji?
George hejiya, paşe bi awayeki ne Ji dil dest pe kirş
Wi bi dengeki betam fi monoton digot:
- Min e Ji xwe re kar biditaş tu caran sere min nediket belayeş
Eiwsekiniş
- Dom blkeş Lennie, gotş Dawiya meheşşş
- Dawiya mehe gava ez penci dollaren xwe bistinimş ez e rasterast herim kerxaneşşş
Disan sekiniş
Lennie bi heyecan H wi diniheri:
- Dom bike, Georgeş Tu e he Ji erza mln neşikini?
- Na George gotş
Lermle:
- We caxe ez herimş gotş Ez bidim re ii derkevlm ciyeş ez jl xwe re 11 ştkefteke bigerimş Ger tu mln nexwazi ez e herim Georgeş
George disan hejiya:
- Naşşş got Ez dixwazim tu H vtr, H ba mtn blminiş
Lermle bl xasiikU:
- Bejeş got weke her carş

- Ez e Ji te re ci bibejim?
122
- Ferqa di navbera me fi yen dhi deş
George got:
- Kesen ku weke me be kes fi kiis inş ew hinek pere didine hevş paşe bi careke ve xerc dikinş Keseki wem e ku ew le bifikirinş tune yeş
Lennie bi nerineke dilşa:
- Le em ne wilo ne, gotş Em cawan inş behsa we Ji bikeş
George demeke bedeng ma
- Em ne wilo neş gotş
-Jiberku?şşş
- Ji ber ku ji bo mhi tu hejrişşş
Lennie bi dilşahi qiriya:
- Ji bo te Ji ezşşş Ji ber ku em herdu Ji H hev difikirinş Sira baye evari hedika H ser erda rast dihatş ava kesk dileriziş Denge peyan ve care geleki nezik dibuş
George şewqe xwe dendstş bi dengeki lerzoki:
- Lennie, şewqe xwe derxe, got ro xweş eş
Lennie mina berxikan bi a wi kirş şewqe xwe derxistş dcmi ber xweş Li geli her ku dicu dinya heniktir dibfiş her ku dicfi taritir dibfiş Beş denge şaxen pelciqi dibire wanş
Lennie got:
- We paşe ci bibeş beje?
George denge hengameya ku Ji Jore ve dihatş bihistlbuş

Demeke mina ku ew kareki bike, dipeyivi:
- Li aliye cem ye din binereş Lennieş ez e Ji te re
ewqasi xweş behs bikimş ku ew e were ber caven teş
Lennle sere xwe zivirand u 11 allye wi ali cem, li
pişta ciyayen Gabilane ye reş niheriş
Geoige:
123
- We ciftlikeke me ya bicfik cebibeş got ii desten xwe
xistin beriken cakete xweş Wi nicike eminiye ye
demanca Carlson ya Luger vekirş bi deste xwe
demanca Ji pişt Lermie derxist u dani erdeş Paşe wi 11
paş stuye Lennieş II xala ku hestiye pişta wi ii tasa sere
wi le digihiştin hevş niheriş
Ji Jora cem peyayeki bang klrş peyaki din Ji li wi vegerandş
Lennie:
- Heydeş dest pe bikeş got
George rahişt demanceş Deste wi dihejiyaş wi disan
deste xwe berdajerş
Lermie:
- Heyde bejeş gotş em e paşe cl blkin? We ciftlikek me
ya bicfik cebibeş
- We ciftltkek me ya bicfik cebibe, George gotş Belki
beraz ii mirişken me ji cebibinşşş U erde me ye nefele
Jişşş
Lennie:
- Ji bo kiroşkan! bl qerin gotş
Geoige:
- Ji bo Idroşkan!

- Ez e li kiroşkan binerimş
- Tu e U kiroşkan bineriş
Lennieji kefan furiya:
- Em e mina maldaran bijinş
-Ereş
- Naş Lennieş Ll wi aliye cem binere; ne mina ku tu
ciftlika me dibini?
Lermie deng neklrş George 11 demamca li erde niheriş
Nihaji nava deviyan teperepa Hngan dihatş George
ziviri u li we hele niheriş
124
- Dom bike, Georgeş Em e kengi wir bikirin?
- Di nezik deş
- Em herduş
- Em herduş E>w e her kes baş bi te re bide fi bistineş
Em e sere xwe nexin belayeş E^v e xerabiya me negihije
kesi, em e male kesi nedizinş
Lennei got:
- Min digot qey tu Ji min xeyidi yiş
- Na George gotş Naş Lennieş Ezji te nexejidi meş Ez
tu caran Ji te nexeyidi meş ez nihajiji te ne xeyidi meş
Ez dixwazim bi ve yeke dile te di cih de beş
Deng nezik dibfinş George rahlşte demance ii 11
dengan guhdari kirş
Lennie 11 ber geriya:
- Em vi kari tavile bikinş Em tavile ciftllka xwe ya
bicuk bikirinş
- Ereş ereş em e tavlle biktrinş Em e herdu btkinş

George rahişt demance, bei ku deste xwe tev
bilivineş pe girt fi liila we neziki pişta stfiye Lennie kirş
Deste wi bi şidet dileriziş Le pişti kurtedemekeş rfiye wi
hate guhertinş deste wi sabit buş Berdayeş Denge
demance pişti ku bi giran ve rapeliki, disan dakete Jerş
Lermie Ji cihe xwe hol bu, peşi hedika şemiti, deverii H
ser qume ketş bei ku tev billveş li erde raxisti maş
George lerizi ii 11 silaha xwe nlheriş paşe ew avet duri
qiraxa cemş ser koma xweliyeş Nava dar fi deviyan bi
denge mirovan fi bi denge teperepa lingen wan mişt
bfibuş Denge Slim hate bihisUn:
- George! Tu H ku yi ş George!
Lebele George bi rewşeke behal li qirgixa cem
runiştlbiiş 11 deste xwe ye ku pe demance avetibii,
dlnlheriş EXv peya keUn ser erda rastş Curley II heri seri
125
bfiş Wi, Lermieye ku li ser qfime direjkiri biiş ditş
- Ma te ew geber kir?
Ew neziki Lennie bii ii le niheri, paşe ziviri ii 11
George niheriş Bi hedika:
- Te tam bera paş stuye wi dayeş gotş
Slim rasterast cu ba George ii 11 ba wi runişt
- Li ber nekeveş gotş Mirov cama mecbiir dimineş
Le Carlson 11 ber sere George sekini biiş
- Te cawa ev kir?
George bi dengeki westiyaja:
- Min hema kirş gotş
- Ma demanca min bi wi re bii?

- Ereş demanca te bi wi re biiş
- Demek te ew girtş te demance Je stend u te ew kuştş
ha?
- Ereş min wilo kirş
Denge George edi mina ku bi pistini dihatş Wi caven
xwe Jl deste xwe ye rasteş ye ku pe demance avetibilş
nediqetandş
SUm bi enişka George girt:
- Rabe, George, em herin bi hev re tişteki vexwinş
George bi alikartya wi rabii ser xweş
- Ere, em Uşteki vexwinş
- Tu mecbiir bu ku te ev bikira Georgeş Bi namiis tu
mecbiir biiş Heyde em herinş
Wi George heya bi şiveriye bir, Ji wir Ji ew ber bi re ve
ciinş
Curley ii Carlson 11 du wan niherinş Carlson:
- Ji bo Xwede, ci bi vem hattye?
126
MIşK U MIROV
John Steinbeck
Xelatgire Nobele ye 1962'an John Steinbeck, yek ji
niviskaren cihane ye bi nav u deng u xwediye ciheki bi rumet
eş Herciqas ew betir bi romana xwe The Grapes of Wrath
"Tiriyen Xezebe" di nava xwendevanen kurd de te naskirin ji, le
betir ve romana wi OfMice and Men "Mi^k u Mirov" ew
kiriye xwediye ciheki bilind ii naveki gerdiini ş Mişk u
Mirov di derheqa du kaikeren ciftlikan; Georget hurik u biaqil
u Lenniee girs u kemaqil de yeş Herdu heval ji hev naqetin, ew

mina goşt u neynuke bi hev ve ne, her tişten xwe bi hev re par ve dikin, heta ew şiriken xewn ii xeyalen hev in jiş
Ev romana kurt, resimeki jiyana karkeran yen Amerikaya salen sihi radixe ber cavanş Weşanxaneya me, ve romana ku derbasi zimane kurdi buye, bi serbilindahi peşkeşi xwendevanen kurd dikeş
**

PÊŞMERGE

Rehîmê Qazî
NUDEM
Weşanên Nûdem: 33
Pêşmerge
Çapa Yekem: Êrîvan 1960
Çapa Duwem: Bexda 1962
Çapa Sêyem: Stockholm 1997
© Weşanên Nûdem
Pergala bergê û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê: Ata Kazaz
ISBN: 91 88592-33 2
Adres:
Nûdem
Termov. 52
1 76 77 Jarfalla-Sweden
Tel û faks: 8-583 564 68
Pêşgotina weşanxanê
Ev berhema di destê we de, di sala I958'an de ji aliyê Rehîmê Qazî ve hariye nivîsandin. Berhem têkoşîn û xebata siyasî-civakî ya serdema

Komara Kurdistanê radixe ber çavan; jiyana pêşmergetiya wê demê, zordestiya
dagîrkerên Kurdistanê, zilm û bindestiya hundurî bi awayekî sade digihîne me û behsa bûyerên rasteqînî û awayê xebata siyasî, kulturî û eskerî ya wê demê bi uslûb û awayê romankî tîne zimên.
Ev pirtûk, bi celebê pirqehremanî hatiye nivîsandin. Qehremanên wê çend kes in. Tîpên mîna Mîrza Qutas çêkirine ku, li Kurdistanê sembol û nimûneyên belavkerên bîr û fikrên neteweyî ne. Ev dikarin bibin alavên baş ji bo lêkolînerên vî warî. Tîpên mîna Mîrza Qutas, ku ne tenê li rojhilata Kurdistanê, belko li seranserî Kurdistanê jî hene, ew tîp in ku xebata neteweyî ya destpêkê meşandine.
Rehîmê Qazî, di sala 1925'an de li rojhilata Kurdistanê, li gundê Gwîgceliyê,
li navçeya Mukriyanê hariye dinyayê. Ew ji malbateke bi nav û deng e. Vê malbata han di riya xebata azadiya Kurdistanê de gelek sehîd dane. Yek ji wan ku ji aliyê hemû kurdan ve rêz û hurmet jê re tê girtin û bi minnet tê yadkirin, Qazî Mihemmed e.
Rehîmê Qazî, yek ji wan 60-70 kesan e ku di sala 1946'an de ji aliyê Komara Kurdistanê ve ji bo xwendin û perwerdekirina kadroyan çûbû Bakûyê. Piştî çûyina wan bi pênc-şes mehan, bûyera ji holêrabûna Komara
Kurdistanê diqewime, gelek ji wan xwendevanên kurd vedigerin Kurdistanê. Lê Rehîmê Qazî û çend kesên din li wir dimînin. Paşê ew dest bi xwendina akademîk dike û di sala 1954'an de reza xwe ya doktorayê
li ser tevgera neteweyî ya kurd, pêşkêşî unîversîteya Bakûyê dike.
Dr. Rehîmê Qazî di salên xwe yên koçberiyê de, li Sovyetê, vala nasekine. Dema ku Barzanî diçe Sovyetê, Rehîmê Qazî bi wî re dikeve têkiliyê

û têdikoşin ku serokatiyek nû li Kurdistanê bê avakirin. Dr. Rehîmê Qazî jî bi Mele Mustefa Barzanî re di nav vê serokatiyê de cih digire. Lê ev kar zêde dewam nake. Ew û çend hevalên xwe bi hecma yekrûpelî rojnameya
Kurdistan diwesînin. Ew vî karê han 13-14 salan didomînin.
Dr. Rehîmê Qazî, ev romana bi navê PÊŞMERGE, di salên xwe yên koçberiyê de nivîsandiye. Pqmerge cara yekemîn di sala 1960'î de li Êrîvanê
û di sala 1962'an de jî li Bexdayê tê çapkirin. Di sala 1964'an de li Bakûyê bi zimanê azerî tê weşandin. Li Kurdistana Iraqê, ji aliyê edebiyatnas
û pisporan ve pêswaziyek bas li romanê tê kirin.
Piştî ketina Şah û hatina Xumeynî, Rehîmê Qazî vedigere Kurdistanê. Ew besdarî kongeraya çaran ya Partiya Demokrat a Kuristana îranê dibe û ji bo endametiya Komîteya Navendî tê helbijarrin. Di sala i98i-82'an de ji ber hinek sebebên polîtîk ew careke din ji Kurdistanê derdikeve û vedigere Bakûyê. Ew brosurekê bi navê Mihakemeya Qazî Mihemmed û pirtûkekê bi navê Qazî Mihemmed û Tevgera Rizgarîxwaziya Gelê Kurd dinivîsîne.
Dr. Rehîmê Qazî, di nehê gulana 1991'^ de, ji ber nexwejiya apandîsê li bajarê Bakûyê wefat kir.
Em vê romana ku Ziya Avci ji soranî adapteyî kurmancî kiriye, bi niyeta avalririna pireke edebî di navbera perçeyên welêt de, bi serbilindî pêşkêşî we xwendevanên dilovan dikin.
Bi hêviya ku wê bi dilê we be. . .
NÛDEM
Zivistana Kurdistanê ye, ewqes sir û serma ye ku hindik
maye xwîna nav demarê mirov bimeyê. Tu tif dikî dibe

qeşa û dikeve erdê. Ewran pêşiya asîman girtine, deng ji zîruhek nayê. Teyr ji çeng û bask ketine, ji bo xwe bihewînin, li gund, deşt û perçepalên çiyan li ciyekî reşbelek digerin. Rêzên çiyan, deştên rast û rewan û ew malên di kolanên wan de dukelên reş derdikevin, bi kefenê berfê hatine rapêçan. Erd, tu dibêjî li muqabilê zulma asîman gazindan dike û dinale, karêzên kaniyan bîhna xwe vedidin û car caran bayekî sar bi ser gund de diheje, ew xortên ku li qeraxên sergoyan û li ber penayê kalaxan ji bo parastinê sekinîne, mecbûr dibin biçin mizgeft û malan.

Gundê Kanîsewzeyê nêzîkî Seqizê ye û gundekî herî xweş û bi dêmen ê Kurdistanê ye. Dikeve ber perçe pala çiyayekî bilind, her çar aliyê wî bax, mêrg û çîmen in. Ew kaniyên ku ji hemû milan ve diherikin û di palan de bi xure-xur ber bi geliyan ve ber bi jêr dibin û ji geliyên aşan derbaz dibin, spehîtiyeke taybetî ya tabîî dane Kanisewzeyê.

Nêzîkî sed malên biyanî û cot û bend di Kanîsewzeyê de hene. Hemû kewşenê gund ê axê ye. Çar malên xwediyê cot û bendan bi jina axa re û pênc malên din jî bi kur, keç û bûkên axa re nîvekarî zîraetê dikin. Xwediyê cot û bendan, tenê şeş mal bûn ku xwediyê wê taqetê bin bi şertê ji dehan didu cotkariyê bikin.

Ji biyaniyan jî bîst malan ji bo xwediyê milk û zarokên wî li gor ji sisiyan yekê kar dikirin û yên din jî bi paletî, karkerî û çerçîtî xwe îdare dikirin.

Kek Mamend, yek ji wan biyaniyan bû ku li gor ji sisiyan yekê kar dikir û tam neh mehan bi jin û zarokên xwe ve li ser erda axê dixebitî û bi rojên nemir-ne jî zivistana xwe derbaz

dikir.
Lê ew sal, ew sala reş, pişta xwe dabû kek Mamend û ew muhtacê nanê tisî kiribû. Teyrok û kuliyên bêwext û jenga heta ber xemaman temamê dexil pûç kiribû. Ew tutina li berpala çiyê ku bi hezaran zehmetî tê de hatibû xwarin, garana mala axê ketibûyê û hemû perçiqandibû.
Kek Mamend çend caran çûbû li ba axa ku bi qerz çend bar genim an ceh bidê, lê axa dayîna bi qerz genim û ceh deyne milekî, bi ser de daxwaza heqê ga û cotên xwe jî jê kiribû û bi serbarê vê de, jê re gotibû ku, ew tovê ji bo çandindiniyê dabûyê xesar bûye, gerek bîne û têke enbara wî. Axa ji bo ga û cotê xwe herroj muxtar dişand ser mala kek Mamend.
Rojekê Mamend diçe ba axê û jê re dibêje:
- Axa, Xwedê xezeb barand û dexla min ji min sitand. Garana te jî tutina min perçiqand. Keda min û zarokên min ya neh mehan di avê de çû. Niha gunehê te bi keda min, birçîmayîna jin û zarokên min nayê û bi ser vê de jî tu doza tov, ga û cotê xwe ji min dikî. Axir Xwedê vê qebûl nake! Eger bîst teneke (pût) tovê te tê de çûye, yê min jî zehmetî û keda salekê tê de çûye. Hemû xelkê gund jî dizanin ku garana te tutina min perçiqand. Axir bê bela be mercê ji sisiyan yekê bi vî awayî nîn e... Ez li asîmanan ji Xwedê û li ser rûyê erdê jî ji.te şik dikim, were bike sedeqa serê kurên xwe û li min bibore...
Axa ji wan gotinên Kek Mamend ku bêhna gazind û îtîrazan jê dihatin xeyîdî û ji ber xwe ve niriya û got:
- Erê, kî li wir heye? Werin vê sebabê derêxin derve. Me tu xêr ji sêyekbehriya wî nedît, hatiye doza qerzan ji me dike.

Heyî, heyîîî, heyî, bibîne ecêban. Wisan dixuyê tu bi wî hêtîmê xwe re çûyî Seblaxê û bûyî pêşmergeî. Ji ber vê tu gotinên bi vî awayî yên mêraniyê li hemberê min dikî. Ne, neee bi serê te ez ji wan natirsim û nahêlim lingên wan li vî gundê bikeve. Ez nahêlim ew cî û warên ku ji bab û bapîrên me ji me re mane ji biyaniyekî rût re bên dan. Kurmanc çi ye ku di muqabilê axayê xwe de xwe însan hesêb bike? Kurmanc çî ye ku bêje ez jî heme...

Xulamên axê bi çepilên kek Mamend girtin û ew derxist derve...

Niha, di çile-kanûna vê zivistana han a xedar de, ew tiştên ku di bîra kek Mamend de, tenê ew bû ku dê çawan ji zarokên xwe re pariyek nan bi dest bêxe.

Roja din serê sibê, kek Mamend ku temenê wî ji şêst salan derbaz bûbû, siwarê kerê boz bû, di kolanên gund ên tejî berf de ber çiyê ve meşiya. Cil û bergên li ser kek Mamend paltoyek ji sed perçeyên pênekirî, di ciyê piştiniyê de çend perçe kapên di çend ciyan bi hev ve girêdayî, di ciyê pêçek rîşî de cawekî spî yê ji ber qirêjahiyê reş bûyî û cotek lakaşên ji çermê gayê mirarbûyî bûn. Vî dîmenê han ji dûr ve feqîrî, rebenî û lêqewmiya siwarê kerê ji hemû kesî re dida nîşan. Mamend, di ciyê karên navtijî, goşt û birinc û gwîz û mewîjan, nanekî reş ê ji arê cehê nebeyî kiribû paxila xwe û serê wî di ber de, car caran li kerê xwe dixist û xwe bi xwe bile bila wî ba û digot: "Heft serî xêzanê min du roj e bê nan û bê xwarin mane û çavê wan tevan li destê min e. Pîrût jî va çend mehin çûye Makûyê û tu xeberek jê tune. Bi çi awayê dibe bila bibe, niha divê di vê zivistana xedar de ez ji çiyê darên

berû berhev bikim û bibim bajêr bifroşim û wan derêxim biharê... Eger ez di vê riyê de bimrim jî, ji wê baştir e ku çavê min li destê wî nemerd be. Ez dizanim, eger ez gaziyê Pîrût bikim û wî bikim xulamê axê û ez wî mecbur bikim ew dev ji wî karî berde, dê wê çaxê kar û barên min baş bibin. Lê ez vê nakim û sitoyê xwe li ber wî namerdê natewînim. Çare çi ye? Ez li ber wî bisekinim û hêvî û lavayan ji wî bikim? Ez biçim parsê bikim... ne, neee, ne, parskirin ne layîqê min e...! Dayîka min şîrekî helal daye min, wê ez serbilind perwerde kirime... kula dilê min Pîrût tu li ku yî! Eger te tiştek jî nekiriba, te ê di vê zivistana sar û serma de alîkariya babê xwe bikira..."

Kek Mamend ji bo ku demek zû bigihîje ciyê xwe bi lez kerê xwe diajot:

Deh, deh! zarok birçîne, çavê wan li rê ye...

Kek Mamend nêzîkî çiyê bû. Lê dinya çiqas diçû tarîtir dibû. Ewr wek rêzên ordiyan li pişt yekûdu rawestabûn û hergav li hêviya fermanan bûn. Kek Mamend li asîman nêrî û bi dilekî tejî ber xwe ve got: "Xwedê bike nebare, hekene dê zarokên min ji birçîna bimrin, çavê wan li riya min e..."

10

Lê asîman guhê xwe neda hêvî û lavahiyên wî. Befr û bagerê dest pê kir. Dinya ronak berê xwe da şeva reş û tarî. Çav çavan nabîne. Çi gava rêçeriyek tê dîtin, di cî de befir ser digre û ew wenda dibe. Kerê boz ji taqet ket û herdu guhên xwe yên sor şor kirin sekinî. Kek Mamend berê xwe da kerê boz û got: "Ker ker e... ey mexluqatê bê zehr û ziman, ma tu fehm nakî ku tu jî wek zarokên min birçî yî, ez çi dixwim tu

jî wê dixwî... em herdu jî bûne cehxwer!!! çuh, çuh..."
Lê ew gotin di guhên kerê boz de nediçûn xwarê, êdî taqeta meşê di çokên kek Mamend jî nemabû. Kek Mamend berê xwe da hewayê û serê xwe ber bi asîman de bilind kir û got:
- Xwedê, ez çi bikim! ez vegerim, ew zarokên çavên wan li riya min dê ji birçîna bimrin, eger ez venegerim jî ne taqeta min ne jî ya kerê min ber bi çûna jor ve nemaye. Ya herî baş ew e ez xwe bigihînim nav şikevtekê û çaverê bim ku dema berf û bager sist bibe, ez biçim nav daristanê û daran berhev bikim...
Kek Mamend bi halekî seyîtî xwe gihand hundurê şikevtê û xwe tê de hewand. Lê befir û bager nesekinî. Kek Mamend şeva xwe li wir derbaz kir. Şevê her car û car serê xwe ji şikevtê derdixist û li hewayê dinihêrî. Demek nêzîkî nîvê şevê, dît ku asîman ji aliyê bakûr ve dest bi ronahiyê kir û hêdî hêdî sayîtî dinyayê digre, dilê wî xweş bû û di dilê xwe de got: "Welleh dê sibê tav derkeve û ez ê bi hêsanî bikarim daran berhev bikim..."
Sir û serma hewayê, hêviya derketina tava sibê, berhevirina daran û destbileziya gihîştîna hawara zarokên xwe, nedihiştin xew bikeve çavê kek Mamend. Mamend di derya xeyalan de xerq bûbû û difikirî û xwe bi xwe diaxift û digot: "Mirov ii
nizane heta mirinê çi tê serî. Tu kes nizane ka ez niha li ku me û ji bo xatirê pariyek nan di vê sermaya han de min xwe kiriye vê kona han û ez çaveriya derketina rojê me. Bi Xwedê dê rojek bê emê ji vê felaketê rizgar bibin. Vêca were li vî halê

binêre, niha ez di vê sir û sermayê de li hêviya derketina
rojê me, gelo axa li hêviya çi ne? Ez li pê bidestxistina pariyek
nan im, lê ew li pê nêçîra kêroşkan in ku sibê berê şefeqê
biçin û nêçîrekê bi dest bixin. Vêca wan kincên hevrîşim li
tajiyê xwe rapêçane û di ciyên germ de dihewînin, lê ez di vê
şikefta han û di bin vê sir û sermayê de, doşeka min erd û lehêfa
min asîman e û min li xwe werandiye û ez dikim nakim
min nagre... Hey mala te xera bibe nedarî, hinava te reş bibe
desttengî, ca tu bi Xwedê kî ev jî jiyan e, welle halê seyan ji
vê xweştir e...".
Kek Mamend, car caran Pîrûtê kurê xwe dianî ber çavê
xwe, di saya wî de ronahiyek dipekiya ser dilê wî û digot:
"Wey ez kor bim, tu li ku yî Pîrûtê ruhê min? Ne dûr e ew
karê ku we dest pê kiriye tê de ronahiyek ji feqîran re bê dîtin.
Kurê xweşik ma ne tivinga te jî heye...".
Di nav axayên kurdan de bi tajiyan çûna nêçîra kêrwoşkan
xwediyê tertîbek taybetî ye. Li çi gundekî û li ba çi kurmancekî
tajiyek pêsivik hebe, axa bi çi mercê be hewil didin ku
ew bidest bixin. Gelek caran di nav axayan de li ser tajiyan
girê û astengên mezin diqewimin û ji bo reqabeta bi hev re
carnan bihayê tajiyekî ji yê hespekî baş derbaz dibe. Vêca diziya
tajiyan jî tiştekî seyr e. Eger hat û kurmancekî tajiyê xwe
nefroşe axê, hewil tê dan ku ew tajî bê dizîn. Axa, ji bo xwedîkirina
tajiyan tajîvanekî digre. Qerwaşa jina axê kinc û ristên
hevrîşim ji tajiyan re didrû, ji bajêr perçeyên hevrîşim ên
12.
hûnandî û perrikên zîv pê de kirî jê re tînin. Nanpêja mala
axê dibê hemû wextê nanê destpêkî yê germ yê tendûrê bide

tajiyan. Çunkê meşhur e û dibêjin ku: "tajî bi nanê tendûrê yê germ beza dibe".
Demên zivistanan, wextê ku befir dibare, axawet gelek bi dab û dezgeh xwe ji nêçîrê re hazir dikin. Ew şeva ku befir dibarî, li dîwanxaneya axê wek ku şahî û aheng hebe bi wî awayî bû. Wê şevê heta sibê xew nakeve çavê xulêm, qerwaş û seyîsên (meyter) axê. Xulam carinan li asîman dinihêrin û di derheqê hewayê de axa agahdar dikin. Qerwaş ji bo nêçîra sibê kade, qûbûlî, xwerîsa şêrîn û qilûçên xweşik hazir dikin. Seyîs, alif dide heywanan û ew mehes dikin, teng, lixab û rikêfa wan ber çav re derbaz dikin û kincên axê lê dikin.
Di zivistana sala i945an de, eynê ew şeva ku kek Mamend ji bo xatirê bidestxistina pariyek nan bi kerê xwe ve di wê sir û sermayê de xwe kiribû kona şikeftê û wek tîrê subhanê diricifî û zarokên wî li mal birçî mabûn, li mala Qerenî Axa yê xwediyê Kanîsewzeyê bi kêf û xweşiyek ji bo nêçîra kêrwoşkan a sibê re tedarik dihatin kirin.
Wê salê, Qerenî Axa bi lezzet, kêf û xweşiyek taybetî xwe ji nêçîrê re hazir dikir. Çunkê ji payîza çûyî ve bi du telîs genim û dused tûmen pere ji kek Senî yê xelkê Kanîkûzele Guleşîn kirîbû û dê cara yekem di nêçîra sibê de tecrube bikira. Divê bi girtina kêroşkekê tola wî genim û pereyî ji axê hilîne. . .
Mala Qerenî Axa li milê herî jorê yê Kanîsewzeyê bû û kele û xaniyekî bilind ê duqat bû. Kele û xaniyê axa du perçe bû, perçeya yekan jê re enderûn digotin, ku jin, keç, bûk û qerwaşên axê tê de diman. Ew beş di nav hesareke mezin de bû û ji gund ve nedihat dîtin. Perça din jî, ku jê re bîrûn di-

13
gotin, li hemberî gund bû, dîwanxane û bergeha xanî li wirbû.
Axa, bi kur û xulamên xwe ve li wir diman.
Wê şevê fermanderê dayîreya jendirman ê Seqizê sergord
(bînbaşî) Şimînan jî bi çend zabitên din ve bi mêvanî hatibûn
ba Qerenî Axa. Sergord, mirovekî dirêj, req û reştehleyê
zirav bû, ewqas heşîş kêsabû ku herdu çavên wî yên biliqî û
qermîçekên wan ji dûr ve diyar bûn, wek nûkilê bûqelemonê
dihatin xuyakirin û ewqas jar bû, bi pifekê dikarî bifiriya.
Dîwanxana axê bi xalîçe û mehfurên mezin û sipehî hatibûn
raxistin. Di nav dîwanxaneyê de çar sitûn hebûn, her sitûnek
çend balge li ber hatibûn danîn û doşekek biçûk li ber
hatibûn raxistin. Di konceke dîwanxaneyê de radyoyek baterî
hebû. Ji ber dumana cigaran temamê arîk û dîwarên dîwanxaneyê
reş bibûn. Çend lambeyên dufitîl yên neftê dîwanxane
ronî dikirin. Sobeya ji mefreqê ku tejî dar kiribûn,
qirçe qirça wê bû û herçar aliyên wê wek pelên êgir sor bûbûn.
Meclisa qumarê germ bûbû. Sergord Şimîranî, ku pisporekî
qumarê bû, di kaxezçêkirê de Şeytan tîn dibir ser kaniyê
dîn vedigerand. Çûn û hatina wî ya li mala Qerenî Axa gelek
zêde bû. Ew qazanca wî gihandibû Qerenî Axa û kurên wî,
hînkirina wan a bi qumara pokerê bû. Qumara pokerê jî xêr
û bereketa dema Şerê Cîhanê yê Duyem bû ku, ji aliyê Ingilîz
û Emerîkiyan ji xelkê îranê re hatibû dan.
Sergord Şimîranî, Qerenî Axa, kurê axa yê mezin û zabitên
din li derûdora hev rûdiniştin û her yekî ji wan komek perên
kaxezî didanîn pêşiya xwe û bi leyîstina pokerê mijûl dibûn.
Qerenî Axa nizanîbû ew gotinên di leyîstika pokerê de dihatin

gotin baş bi kar bianiya. Gotinên gelek ecêb dikirin. Di
ciyê "dupêr" de digot "du per", di ciyê "ful" de digot "fil", di
14
ciyê "rêst" de digot "rist" û di ciyê "çêp semwar" de digot
"ceh semawer" û yên din. Vêca wî ew gotin gelekî nazik digot
û wisan dida xuyakirin ku te digot qey bi ingilîzî dizane.
Ew menqel, hoqqe û maşeya li tenişta sergord Şimîran hatibû
danîn, dêmeneke taybetî dida dîwanxaneyê. Sergord, ji
bo ku di esnayê leyîstina pokerê de xewa wî neyê mijek li xeşîşa
xwe dida û car caran Qerenî Axa jî mijek lê dida û diniriya
û bang dikir, çay dixwest:
-Kuro, kî li wir e?
Xulam ku li pêsiya xanî rûdinistin, her wext guhê wan li
nirîna axa bû û bersîva wî didan:
- Qurban tu çi dixwazî?
- Çayê bînin, çayê!
- Belê qurban!
Qerenî Axa û kurê wî, mexsus ku dilê zabitan xweş bikin
çi perên li pêşiya wan bû wenda dikirin. Qumara pokerê temam
bû. Serokê jendirman û efserên din temamê peran kirin
bêrîka xwe. Dema nanxwarinê bû. Qerenî Axa cardin bi
wî dengê nexweş nirand:
- Kî li wir e lo? Nên bînin!
Qasek bi ser de derbaz bû, her yek ji xulaman sîniyek tejî
goşt-birinc, tirşik û dew li ser ketin hindur, sênî danîn ber
wan û bi destbesteyî li hewşa ber derî sekinîn. Axa û mêvanên
wî bi mirçe-mirç mijûlê xwarinê ne. Wê şeva dereng
mirçe-mirça devê axa ji serê din ê dîwanê dihat sehkirin, pariyên

wisan li birincê didan, te digot gore û kelaxekî mirî dîtiye.
Ji nav pariyên wî dilop dilop ron dirijiya û lêva wî ya jêr
û hemû derûdora simbêlê wî ji ber şilahiya rûn dibiriqî.
Xulam ku bi destbesteyî sekinîbûn, çavê xwe kiribûn devê
axê û yên mêvanan û ji çavên wan dihat xwendin ku dibêjin:
15
"Wey hûn quzulqurtê bixwin, dê bes bikin, tiştekî jî ji me re
bihêlin. Axir danê xwarina me bermayê we ye, hekene jina
axa sîniyek din xwarina cihê ji me re naşîne. Bes e, bila ji we
re bibe kerrafî, bes e xwe bidin paş!...".
Xwarina şevê gelek kêşa. Piştî berhevkirina sîniyan, ji nû ve
çayek gelek bi dem li pêşiya axa û mêvanan hat danîn û rejiya
menqela xeşîşa sergord jî hat nûkirin.
Hemû hewl û xebata Qerenî Axa ew bû ku, mêvanên wî
wextekî xweş derbaz bikin û dema ku qurte qurta wî bû çay
vedixwar, gaziyê xulamekî xwe kir û jê re got:
- Heme Çewre, ka kilameke Şikakiyan ji me re bêje.
Heme Çewre dest pê kir:
"Delê heyê lolo, heyê lolo, heyê lo nemînim li ber vê dinyayê...
Delê ba ba derê, li min derê eman
Sed ne'let bê li wan kesan
Ji ser ve birayê giyanî-giyanî
Ji bin ve temahî dikin bi me'şuqa dostê biraderî
Delê heyê lo, heyê lolo nemînim li ber wê xezemşorê heyê hooo...
Heme Çewre, du-sê bendên din jî gotin, lê Qerenî Axa hîs
kir ku xweşa sergord naçe, bi îşaret Heme Çewre têgihand
ku bibire û derkeve derve.
Pişt re axa mesela nêçîra sibê avêt ortê û bi kurên xwe re li

ser kifşkirina heqê nêçîrkêşan (temal) sekinî. Her çend Qerenî Axa dixwest heqê nêçîrkêş gelek kêm be, lê ji bo ku kurên wî xwe li hemberê xulaman merd bidin nîşan, hewil didan heqê nêçîrkêş zêde be. Piştî xir-cirek zêde heqê nêçîrkêş 50 tumen hat birîn û biryar hat dan ku rista Guleşîn di destê Babekir Axa yê kurê Qerenî Axa yê mezin de be.

16

Di vê muddeta han de, ku Heme Çewre kilam gotin û di navbera axa û kurên wî de asteng û muşkilê hebûn, fermanderê jendirman pala xwe dabû balgiyê û lez bi lez nefês li hoqqeya heşîşa xwe dida û ketibû nav deryaya xeyalan. Guhê wî qet ne li wan gotinan bû û çavê xwe ziq bera xalekê dabû û dema ku Qerenî Axa got ku çayê bînin, ew hişyar bû û bi ser xwe de hat û bê ku gotina "axa" bi kar bîne, got:

- Qerenî, bi rastî tu mirovekî kêfçî yî...

Qerenî Axa di cî de gotina fermanderê jendirman birî û ji bo xulam û kurên wî ew gotinên wî yên sivik seh nekin, berê xwe da wan û ji wan re got:

- Derkevin û ji bo nêçîra sibê xwe hazir bikin.

Sergord bi mexseda Qerenî Axa gihîşt û hinek din jî serbest hereket kir û bêyî jê şerm bike û wî însan bihesibîne, dest bi axaftina xwe kir û got:

- Ey peder sexteyê ehmeq! Tu qet dizanî ku heta niha bîst û pênc kes ji gundê te çûne Mahabadê û bûne pêşmerge? Li gor ew deng û behsên gihîştine me, hêzên pêşmerge Bûkan girtine û ber bi Seqizê ve tên. Mirov dibêje tu agahê te ji dinyayê tune. Mirov evqas jî gêj dibe? Di demek wiha de bi vî awayî bi dem û dezgeh ve xwe ji nêçîrê re hazir dike? Tu

qet wê dizanî ku hinek kesên dewlemend ên Seqizê ji tirsan bargeh û biniyên xwe dane hev, dikin ber bi Tehranê ve biçin? Tu jî di guhê gê de yî. Qesem bi cûbbeyê paşa, eger pêşmerge bên vir, dê halê kûçikan bînin serê te ûdê ava serê te germ bikin. Ew rojnameya kurdî ya li Mahabadê derdikeve lîsteya hemû axayên ku xizmet ji Şahînşahî re kirine, nivîsandibû. Navê te li ser ê tevan re bû. Rojnameyê we welatfiroş û kasealêsê ber deriyê paşa binav kiriye. Tu dizanî ku ez dostê te me, ez ji bo qenciya te dizanim ku gelek e tu hinek hîşyar

17

bî û belko...

Di vê navê re Şimîranî, bi maşa desê xwe de agirê menqelê xweş kir û ji nîvê dilê xwe ve mijek li hoqqeyê da û dumana wê daqurtand û pişt re ji kona poz û devê xwe ve duman ber bi Qerenî Axa ve berda. Di wî kerî de ewqas mahir û pispor bû ku, wî wek sen'etkarekî herî baş ev wezîfeya han bicî dianî. Qerenî Axa, piştî vexwarina dumanê berkenek hatê û destê xwe bi simbêlê xwe de anî xwarê û fikra fêrmanderê jendirman bi vî awayî temam kir:

- Yanê tu dibêjî ez xwe ji çûna ber bi Tehranê ve hazir bikim?

Fermanderê jendirman bi hejandina serê xwe da xuyakirin ku Qerenî Axa ew fehm kiriye.

Qerenî Axa yek ji wan axayan bû ku piştî têkçûna dîktatoriya Riza Xan, siwarekî zêde ên çekdar ji xwe re dabûn hev û hemû wextê sed siwarên hazir û amade pê re bûn.

Qerenî Axa, di eksê besa piraniya axayên Kurdistanê, piştî têkçûna dîktatoriya Riza Xan, xulametiya hukumetê bijart û di ciyê wergirtina çek û qurixan her meh pereyekî zêde jî distand.

Qerenî Axa li melbenda Seqizê bûbû çovê destê hukumetê
û çend caran hereketê gundiyan dabû ber gulleyan.
Qerenî Axa, ji ber ruhê welatfiroşî û karên xerab, dîqqeta
karbidestên ingîlîzan jî kêşabû ser xwe û çend caran karbidestên
ingilîzan ji Sine û Kirmaşan bi navê "mêvanî"yê hatibûn
mala wî û emaneta pêwistiyê dabûnê...
Qerenî Axa ku bi berken guhê xwe dabû gotinên serokê
jendirman, mijek li cigara xwe da û bi de'ye û teşexxûsek
taybetî berê xwe da mêvanê xwe û ji bo şarezatiya xwe ya di
zîmanê farisî de îspat bike, bi kurdiyeke farisî têkelkirî got:
18
- Cenabê reîs, eger tu kes nezane, lê tu bi qehremantî û
merdayetiya bendê xwe beledî. Du sal berê niha, dema ku
kurmancên Pabûrehnan dixwestin şaxê komelê li vir vekin,
min karekî wisan anî serê wan ku bayê neanîbe serê konên
kevin. Min di orta nîvroyê de du kes ji wan girtin. Temamê
gundiyên derûdora Seqizê bi vê tirsiyan. Tu kes li ber min
nikare bêje ez heme. Gelek mixabin hê te xulamê xwe nas
nekiriye. Qurban, xulamê te di muqabilê wan de begzade
kutenî, kilke newtênem û her eyê tînmewe. Di nav kurdan
de banzdan 'eybek mezin e. Kesê ku banz bide di nezera wan
de ji jinekê kêmtir tê hesêb kirin. We jî ku ji Tehranê teşrîf
kiriye û hûn hatine, Xwedê selametiya we bide, her wext fikra
firarkirinê di mejiyê we de ye...
Di vir de fêrmanderê jendirman gotina Qerenî Axa birî û
bi awakî hêrs jê re got:
- Xefê şû, merdîkê (devê xwe bigir, mêrik) bê şu'ûr...
Navek re herdukan serê xwe kirin ber xwe û dîwanxane

bêdeng bû. Qerenî Axa cigara di destê xwe de avêt û yeka din vêxist û bi dukela cigarê hinek ser bi xwe ve hat û serê xwe hilda û got:

- Cenabê serkar! tirs lazim nîn e. Siwar û yekîneyên min ên çekdar li Seqizê ruhê pêşmergan derdixin, we e'lehezretê Xumayûn xeledellahû mulkuhû î'tîmadekî fewqûl'ela bi me heye. Ba xusus ew tankên ku li memalikê Emrîka anîne pederê pêşmergeyan dişewitîne. Çekdarên we hene, topên we yên awa awa yên dûravêj hene. Hêzên pêşmerge tenê xwediyê tivingek rût in. Gulleyên tivingên wan tesîrê li tankên we nakin.

Piştî van gotinên Qerenî Axa yên bi farisî lê bi awayê kurdî, ev şiîra Se'dî xwend:

19

"An ne men basem ke rojî ceng bînî piştî min
An menem kender meyanî xakûxmên bînî serî"
("Ez ne ew kesim ku di roja cengê de pişta min bê dîtin
Ez ew kesim ku serê wî di nav ax û xwînê de bê dîrin".)

Fermanderê jendirman ku ji ber kêşana bêsekin a heşîşê wek golikekî lê hatibû, herdû lingên xwe dirêj kiribûn û pala xwe dabû balgiyan û ji xwe mezinkirin û pozbilindiya Qerenî Axa hêrs bûbû. Bi dengekî noze noz dest bi xeberdanê kir:

- Hey malwêran, hey mal lê xerabiyo, tu dibêjî te kurdbûna xwe jî jibîr kiriye. Qet par ne pêrar jî nayê bîra te. Qey jibîra te çûye, Ehmed Xan li Seqiz bi xenceran çawan tankên ordiya Şahînşahî bêkêr kirin. Ew kurdên ku ez nas dikim, tankê deyne milekî, heta xewfa wan ji firokan jî tune, tirs di çavê wan malxeraban de tune.Wekî mûriyan bi tankan ve

hildikişiyan û bi xenceran şofêrê wê kuştin. Niha jî kelaxên wan tankên ku kurdan wan bi xenceran xirdûxwaşî kirine li kolanên Seqizê hê mane û gundî ew bi tevr û çêkûçan perçe perçe dikin û dikin gêsin. Mimkûn e gêsnên piraniya re'yeta te jî ji hesinên wan tankan bin...

Serokê jendirman ku ev gotin digotin, di dilê xwe de jî di nav tirsê de bû û devê wî ziwa bû û ji bo ruh pê de bê nefesek din li heşîşa xwe da û qurtek çay ser de kir û cardin dest bi xeberdana xwe kin

- Vê jî bizane ku, Qazî dest bi siyaseteke baş kiriye û mala me xera kiriye. Temamê esîretan lihev aniye, beşa piraniya wan ber bi şoreşê ve kêsaye û niha ew jî bi siwarî û bi çekên xwe ve dikevin nav hêzên pêşmergan. Ji Kurdistana Iraqê herroj deste deste kurd tên Mahabadê û dikevin nav hêzên ao

pêşmergeyan. Ew Barzaniyên ku dijminê xurt ên Melik û ingilîzan bûn û li Iraqê tu rehetî nedan ingilîzan, niha di nav rêzên bereya pêşmergeyan de nin. Em gelekî bi hêvî bûn ku, hêza pêşmerge ser nakeve û dê bêserûberîtî di nav wan de çêbe. Lê ew zabitên kurdan ên ku ji Iraqê hatine Mahabadê, di nav hêzên pêşmerge de qanûn, qayîde û rêçek wisan ava kririne ku temamê zabitên ordiya Şahînşahî jê şaş mane. Ev zabitên han bi awakî wisan şarezayê fenên leşkeriyê ne ku, beşa piraniya sertîp û serleşkerên me avê li destê wan dikin. Wellehî di nav wan de çar zabit ên navên wan Izzet, Mustefa Xoşnav, Xeyrullah û Mihemmed Mehmud hene ku, di zanistî, tedbîrî, şarezatî û azayetiyê de kesên wisan in ku di dîroka ordiyan de wêneyên wan kêm hatine dîtin û gelek zabitên

me yên bi nav û deng ji tirsa wan ji xwe re li konên
mişkan digerin...
Qerenî Axa ku bi dîqqet guhê wî li wan gotinan bû, bi çavekî
xezeb û bi hêrs li ser, dev û çavên lihevketî yên Şimîranî
dinihêrî û qet kêfa wî ji gotinên Şimîranî re nedihat. Qerenî
Axa dixwest behsek din bavêje ortê û mijara axaftinê biguherîne,
lê fermanderê jendirman fîrset nedayê û got:
- Erê baş hat bîra min. Ew Pîrûtê ku ji re'yeta te bû û li
melbenda Seqizê sitar û tebata wî tunebû, niha li ku ye? Ew
mirovekî çavsor û netirs e...
Fermanderê jendirman bi awakî wisan ew gotin got ku, dixuya
dilê wî gelek ji Pîrût tijî bû û bi hilanîna navê wî tevzek
di laşê wî de hat xwarê.
Qerenî Axa di bersîva xwe de wiha got:
- Qesem bi serê Şahînşahî, min hal û ehwalê Pîrût ewqas
perîşan û pejmûrde kiriye ku, ew bi tu awayê bi wê serwetê
nikare dijîtiyekê bike. Min bab, dayîk û malbata wî duçarê
XI
derd û elemek wisan kiriye ku bi tu mercek qudreta xelasiyê
ji wan re tune. Vêca bila Pîrût jî biçe Mahabadê û bibe pêşmerge.
Êdî şev gelek dereng bûbû. Qerenî Axa ji bo ku dilê fermanderê
jendirman xweş bike û ji derd û kûlan dûr bêxe, jê
re got:
- Cenabê serkar! dilê xwe neêşîne, tu li kar û kirinên xwe
binêre. Tu hinekî îstîrahet bike, emê nêzîkî beyana sibê biçin
nêçîra kêrwoşkan dê ew hemû diltengî û xemgîniya dilê me
ji me bidin jibîr kirin. Ji bo xatirê dilê serkar emê sibê Guleşîn
bibin nêçîrê...

Piştî saetekê-du saetan rabûn. Axa, fermanderê jendirman, zabitên din, kurên axê û deh-panzdeh xulaman ve siwar bûn û ji bo nêçîrê ketin rê. Çend ji wan siwaran bi zincîrên tajiyan girtibûn, du kesên din jî hêştirên bi bar siwar bûbûn.
Wan tim hewil didan ku ji axa û sergord dûr nekevin, ji ber ku dema daxwazek wan bi av û xwarinê hebûya dê ew pêk bianîna...
Pîrût, xortekî bejinbilind, çarmil, xwediyê çav û biriyên reş, singpehn, exlaqxweş û nefsbiçûk bû. Pîrût di nav xortên Kanîsewzeyê de gelekî bi rêkûpêkî û bi quwetiya xwe dihat nasîn.
Wextê zivistanan gundî li ber deriyê mizgeftê berhev dibûn, li ser sergoyê mala axê yê li nêzîkî mizgeftê, bi xortan guşttilî didan girtin. Pîrût temamê xortên hevsalên xwe davêt erdê û tu kesî nedikarî pijta wî bitewîne û dayne erdê.
Pîrût xwediyê simbêlekî reş, zirav û gûrr bû û gelek caran dema ku dihat nav xelkê, digotin: "ha, pehlewanê simbêlba-
11
birî hat!".
Pîrût, heta sala ketina Riza Xan ji ser text, li Kanîsewzeyê bi Mamendê babê xwe ve mijûlê kar û kespa zîraetê bû. Her eynê wê salê, kek Mamend dixwest wî bizewicîne. Lê bûyerek wisan qewimî ku şahî û xwesî bi ser neketin...
Xortên kurmanc ên fêqîr gelek caran dikarin tenê bi du riyan bizewicin. Eger di mala wan de keçek hebe êdî bîr û fikra wan a ji bo zewaca kurê xwe namîne. Mezinê malê bi riya berdêlî kurê xwe dizewicîne. Ew xortên di mala wan de keç tune, gelek caran mecbûr dibin keçê birevînin. Dema ku keçikê direvînin jî dibin mala mela yan qazî û pişt re bi riya

wan bi bab û dayîka keçikê re li hev tên.
Xwişkeke Pîrût a reş-esmer, çeleng û xwînşêrîn hebû û navê wê Xezal bû. Kek Mamend bi hêvî bû ku keça xwe bide xortekî xwedî xwîşk û pê re berdêlî bikin û Pîrût bizewicîne. Li gundê Kanîkîsele yê nêzîkî Kanîsewze keça kurmancekî ya navê wê Mirût hebû. Sipehîtiya wê di temamê welat de deng dabû.
Mirût, temenê wê taze gihîştibû hevdeyan. Bejn û bala wê ya wek tayê rihanê, çavên wê yên reş û belek, birû û mijangên wê yên tîr û kevanî, pora wê ya biriqî ya wek reşemarê, eniya pahn û fireh a wek hîva berê beyanê, reng û rûyê wek keskesora piştî baranê, lêva sor û xalê reş ê pasewanî, diranên wê yên wek Behra Ummanê, çala çena wê ya wek zîndana xortan, cote memikên wê yên wek hinarên negihiştî yên kal, bejinzirava sipehî, nazik û nazenîn, zend, poz û piyên biçûk ên wek befrê tejî ji bazind û xirxalan, kena wê ya wek bulbulan, meşa wê ya wek mehîna kehêl û mêkewên çiyayên berz û bilind ên Kurdistanê, bîhna sosin û beybûnên wê dilê hemû xortan xayîs dikir. Ewqaz nazik, nazdar, exlaqxwes, dilo-
Z3
van bû ku, çi kesê çavê wan lê biketiya, xeyrê îxtiyarî disekinîn û li wê dinihêrîn. Dema ku mirov li qama wê ya birûmet dinihêrî, te digot kaniya xwînê tê de dikele û mirov wek eynika ji kevirê xwe tê de didît û ji ber sipehîtiya wê şerm dikir. Lê, wek hemû keçên kurdan qet ji nemehremî û rûmeta xwe tiştek wenda nekiribû. Terbiye û me'rîfeta Mirût hinekî din jî sipehîtiya wê zêde kiribû.
Pîrûtê bi simbêlê qeytanî jî navûdengiya sipehîtiya Mirût

seh kiribû û ji bo armanca dîtina wê carekê çûbû Kanîkîseleyê.
Wê li ser kaniyê dîtibû û dilek nebêje bi hezar dilan aşîqê
wê bûbû, lê bi xwe re nedîtibû ku eşqa xwe ji Mirût re veke.
Pîrût, ji bo ku xwe nîşanê Mirût bike û dilê wê ber bi xwe ve
bikêşe, ji çend rojan carekê diçû Kanîkîseleyê û li nêzîkî qeraxê
kaniyê li ciyekê rûdinişt û xwe bi xwe dest bi kilaman
dikir. Bi zanetî ew kilamên li ser eşqê û dîlberan bûn digot:
Ji dûr ve diyar e perçema te ya xavê
Ez dîwane kirim bi koşê çavê
Xweziya min li wan kesên ku cîranê te ne
Bi şev û bi roj agahê te ne
Piştê vê Pîrût dest bi kilamek din kir û got:
Ez çiqas dikim fîkir û endîşeyê
Dûrketî ji mirov, mam û qewmîriyê
Di dawiyê de kerim halê derwêşiyê
Mala min wêran kirin çavê
Dîwane bûm ji bo zulfên xwavê
Ez ê hejar kerim davê
*4
Çavê te reş in xumale ne
Memikên te sêvên bi darê ve ne
Xwedê daye neveşêre wan ji me ne
Hatin û çûna Pîrût a zêde li Kanîkîseleyê û ew sitran û kilamên
ku li qeraxê kaniyê bi dengekî xweş digotin, gurpe-
gurp ji dilê Mirût anîbû û wê jî hez dikir demekê zû Pîrût
bibîne û guhê xwe bide sitranên wî. Pîrût bi riya çend pîrejinan
re hîn bibû ku birayekî Mirût ê çend sal ji wê mezintir
jî heye û vê hê zêdetir dilê wî xweş kiribû. Çunkê dê bikariya

biriya berdêlî re bigihîştiya mirazê xwe. Wî ji xwe re eyb hesêb dikir ku bi riya keçrevandinê bizewice, çunkê wî dizanî Mirût ne ji wan keçan e ku bireve. Pîrût dîn û sewda bûbû, her çiqas taqet dikir, lê ji ber sipehîtî û biheyatiya Mirût bi xwe re nedidît û evîniya xwe jê re veke û gotinên wê jî seh bike.

Roj nêzîkî êvarê bû, Mirût bi cotecêrên ser milan ve hat ser kaniyê û dît ku, va dengbêjê wê bi kul û keder li rexê kaniyê rûniştiye û çavên wî li şebeqa rojê ye ku dike here ava.

Ji xeyrê Mirût kesekî din li ser kaniyê tunebû. Mirût wek tawûsê ketibe sed rengan, bi dengekî nerm û lerzok berê xwe da Pîrût û got:

- Erê, gelo tu çima wisan bêdengî û kilamekê nabêjî...

Pîrût, ku di nav kûrahiya deryaya xeyalan de bû, bi sehkirina vî dengê han bi ser xwe ve hat û tevzek wisan giran di bedena wî de hat xwarê ku ew şaş û gêj kir. Lê zû xwe da hev û hîşyar bû, bê îradeya xwe dest bi vê kilamê kin

*5

Eger tu bizanî halê derdê min
Girîn dê te bigre ji zeriya halê min
Binivîsin li ser kêla tirba min
Ez şehîdê ejqê me nekin cefayê li min
Ez çiqas bi dil dilrim ku pîr nebe
Destê min li memikan gêr nabe
Lê çi bilrim dil dîwane ye jîr nabe
Çavên te ji biriyên te restirin
Ew ji marên res jî hisyartirin
Hemû rojê riyan li ber min digirin

Pîrût çend ferdên din jî got, bêdeng bû û rabû ber bi Mirût ve hat.
Pîrût, tam li muqabilê Mirût li milê din yê kaniyê sekinî û ava kaniyê ya zelal ya wek çavên kêvjalê ku bi xure xur di ber wan re diherikî, wek wênekêşekî herî şareza wêneya wan herdu ciwanên xama yên li rexê wê sekinîbûn dikêşa. Pîrût cara yekê bû ku evqas ji nêzîk ve çavê wî bi gula dilê wî diket û bi dîtina bin çavan a bi hezar me'neyan dagirtî ya wê nazdara şox û şeng, pirça reş û hûnandî ya şevê, biriyên wek hîva yekşevî û hinarikên wê yên wek hinara sava çiqas diçû zêdetir şid û şidayî dibû. Pîrût, li nêrîn û temasekirina Mirût têr nedibû. Nevak re sekinî, li milê din jî Mirût serê xwe kiribû ber xwe hêvî bû ku Pîrût tiştekî bêje. Pîrût, rengek da û yek sitand û ewqas perîşan û nerehet bû ku, ji bo ku bikare xwe rabigire tiqe-tiqa wî bû kevirên biçûk diavêt nav kaniyê û bi wan peşkên avê ku car caran ji ber derbên kevirên wî ji kanix6 yê dipekiyan û dûr dibûn, li rûyê Mirût diketin û dilê wî ehwen dibû. Êdî Pîrût nekarî xwe lê rabigire û berê xwe da Mirût, bêyî ku tu destpêkek têke navê, raste rast û her wek tu şerm û 'eybek pê re tunebe, got:
- Erê ruhê çavbelek, tu dixwazî bi min re bizewicî? Wellehî ji hesreta te wexte ez wekî mecnûnan ii çiyan bikevim û tu sebr û tebat li min nemaye. Dê, tu bi Xwedê bikî zû bersîva min bide û birînên dilê min ên xedar û cergê min ê ker-ker carek din jî kul neke.
Pîrût navek re bêdeng bû û bêyî li hêviya bersîva Mirût be, cardin got:
- Ev nî'meteke gelek mezin e ku birayê te heye û ya min jî

xwîşka min heye. Hekene Welleh ez ê mecbûr bimama û min ê tu birevanda. Şukir ji Xwedê re ku ez ji vî karê qirêj ê şermezarî rizgar bûm. Ax ez çi bikim, destê min teng e, hekene dê min bi heft deste zurne û dehul û heft şev û heft rojan dawet û şahîniyek wisan çêbikira ku di temamê dinyayê de deng bidaya. Dê tiştek nabe, Xwedê ji Sultan Mehmûd mezintir e. Bila dil li ba dil be, malê dinyayê ne tiştek e. Ez çawan sibê vegerim, ez ê çend bar dar bibim Seqiz, bifroşim û bi wan peran morîk û xişiran ji te re bikirim. Piştê rakirina hasilata payîzê, înşeallah emê pê şahî bikin û pê şad bibin...
Mirût, ku heta wê demê deng jê derneketibû û ji şerman temamê bedena wê di nav xwîdanê de mabû, bi nerm çavên xwe rakirin, dît ku Pîrût li kaniyê dinihêre, dest pê kir û jê re got:
- Gelo tu çima wiha mat bûyî..?
Ew dengê nizm, xweş û bidil ê Mirût, wek dengê qaz û qulingên qeraxên çeman û qebeqeba mêkewên serê kupên çiyan hat guhê Pîrût. Wisan zanî ku ji ewrên reş jê re xebe-
17
rek hatiye, ji ber vê berê xwe da Mirût û jê re got:
- Tu dizanî, niha min çi dêmeneke xweş û sipehî ber çavên xwe re derbaz kir. Ew roj hat ber çavê min ku, ez di qirçe-qirça germa havînê de dirûniyê dikim, xwîdanê dirêjim, ez têhnim, dilê min gelekî diçe dew û ji nişka ve dibînim ku, va dîzkek dew li ser milê te ye û tu bi naz û nazenîn ber bi min ve tê...Mirût can, bêje ka gelo dê ew roj bê...?
Pîrût ev gotin kirin û li çavên Mirût nihêrî, dilê wî bi awakî wisan dest bi lêdanê kir ku, dengê lêdana dilê wî hindik

mabû herdu guhên wî kerr bikira, lê ew dilavêtineke xweş,
tejî hêvî û armanc û bi daxwazên dahatû bûn...
Mirût bêyî serê xwe hilde, ji wan hemû gotin û pirsên Pîrût
re wiha bersîv da:
- Filankes, ez nikarim tiştekî bêjim. Mesuliyeta min di
destê kekê min de ye. Kekê min çi bêje ez gotina wî dikim...
Mirût ev got û serê xwe hilda û ji bilbisîna çavên wê yên
belek diyar bûn ku, ji nîvê dilê xwe hez ji Pîrût dike.
Pîrût ewqas ji evîniya xwe piştrast, dilgerm û bi bawer bû
ku, bêyî guhê xwe bide gotinên Mirût ên dawiyê, got:
- Çavreş û çelenga min, vê yekê bizane ku, Xwedê te ji
min re û min jî ji te re afirandiye û ez ê sibê ji babê xwe re
bidim gotin û bila bê xazgîniyan û te bi xwîşka min re berdêlî
bikin...
Êdî roj ji asoyan ava bûbû, tariya şevê dikir perdeya xwe ya
reş bi ser dinya ronî de bikêşe. Stêrkan ku nû serê xwe ji asîman
anîbûn der, li wan herdu ciwanên dilgeş, gelek bihêvî û
xweşik dinihêrî, ku li ser kaniyê sekinîbûn û ji ber dilxweşiya
wan ketibûn semayê û bi girje-girja xwe çavên xwe yên fêlezaniyê
li wan girtibûn û her te digot bi wê dixwazin bêjin:
"hê, hê xwe ji xelkê veşartine, lê haya me ji we heye û hê ji
18
niha ve me dest bi govend û şahîniya daweta we kiriye..."
Mirût, cêrên xwe tejî av kirin û da pişta xwe û xatirê xwe ji
Pîrût xwest û ber bi mal ve çû. Pîrût hinekî din jî li ser kaniyê
rûnişt û pişt re rabû û ber bi Kanîsewzeyê ve ket rê, Pîrût
mest û serxweş bû. Agahê xwe ji temamê dinyayê birîbû
mest û serxweşê eşq û evîna Mirût bû. Pîrût, dema ku ket rê

meşiya, xwe bi xwe dest bi kilaman kir û got:
Eger min bizaniya dê tu raketa li çiyan
Dê min singê xwe ji te re bikira doşek sûna ciyan
Va ez diçim, ez û dilê min
Emanet be ji te re, teka gula min
Tavahîvê xweş e, hîv li ser malan
Ku dostê te sipehî be dev jî li ser xalan."
Derengê şevê Pîrût gihîşt Kanîsewzeyê û her çendîn riyek dirêj jî meşiya bû, bi ser çend gir û newalan re derbaz bûbû, lê dilê wî yê tejî eşq û evîn nehiştibû biweste. Pîrût deriyê hewşa malê vekir û hêdî xwe kir nav ciyê xwe, çavê xwe kirin qurmê kêranên xanî û berê sibê pişt re xew çû çavan...
Pîrût, bi riya dayîka xwe Razê, ya di dilê xwe de gîhand kek Mamend. Piştî hevdîtina Mirût û Pîrût, wan çend carên din jî li ciyên xwe yê caran, li ser kaniyê hevûdu dîtibûn. Nasiya Pîrût bi birayê Mirût Şêrko re jî çêbû.
Şêrko jî carekê du caran bi mêvanî hat Kanîsewzeyê û Xezal dît. Herdu alî jî, hem mala kek Mamend û hem jî mala Şêrko bi berdêlî razî bibûn û herdu malan jî hazirî dikirin ku piştî rakirina hasilata payîzê şahî û dawetê bikin...
19
Lê mixabin...
Mîne Axayê Kanîkîsele, temenê wî ji pênciyan derbaz bûbû. Mirovekî zikmezin û fiş, pozberan, çavbeloq, lêvsitûr, navser û çavên wî girj û devxwar bû. Piyên wî ewqas mezin û zikê wî ewqas fiş bû ku, dema diket hindurê xanî pêşî zik û pozê wî dihatin dîtin, mirov bi vê dizanî ku yê tê hindur Mine axa ye. Çar jinên Mîne Axa hebûn û di enderûna mala

xwe de ji her jinek xwe re odeyek veqetandibû û li gor adetan
her şev diçû oda jinekê. Di navbera wan çar jinan de
herroj şer û qirên bû. Her çendîn Mîne Axa kebantiya malê
dabû destê dayîka kurê xwe yê mezin û mifta kîlera hemû
xwarin û erzaqan dabû destê wê, lê jinên din guhên xwe nedidan
wê û çi çaxê çavên wan bi hev biketa, wek kêtikan li
hev dinihêrîn. Roj tunebû ku dema Mîne Axa ji hindur derdiket
û dixwest biçe dîwanxaneya xwe, li jinekê nexistiya.
Mîne Axa çend xulamên xwediyê gotin û xeberên xweş
girtibûn, bi şev û roj gotinên xweş digotin û henek dikirin.
Wî tu carê cigara xwe neditefand. Dema şevê dereng diçû
oda yek ji wan jinên xwe jî xulamekî xwe bi xwe re dibir. Wî
xulamê gore û kincên axê derdixistin û pişt re dest bi çîrokan
dikir û heta xew re biçe. Pişt re jî hêdîka radibû diçû û jina
axê diket hindur.
Mîne Axa, her çendîn çar jinên wî hebûn, lê cardin li ciyê
xwe rûnedinişt û gelek dêvinpîs bû. Bi wê qerefet û halê xwe
ve jî riya jinan digirt û çi jina kêfa wî jê re bihatiya bi desttika
jina muxtarê gund dixwest xwe bigihînê û bi dest bixe.
Sipehîtiya Mirût gurpe gurp kiribû dilê wî kalî. Çi çaxê çavê
wî bi Mirût diket û rastê wê dihat, te digot gorê bi askê ve
daye, bi herdu çavên xwe yên biloq dimeşiya ser, ji serî bigir
heta binî lê dinihêrî. Mîne Axa bi wasiteya çend rîsipiyên
30
Kanîkîseleyê ji Şêrko re xeber şandibû ku eger ew xwîşka bide
wî, dê ew koşkek cihê ji Mirût re ava bike û çi tiştên Şêrko
bixwaze dê bidiyê. Lê Şêrko bi tu awayê razî nebibû ku
xwîşka xwe bide wî dêvinpîsî. Şêrko û xwîşka wî, herdukan

jî dizanîn ku evînî û hezjêkirina Mîne Axa tenê çend roj in. Çunkê heta wê çaxê çend keçên kurmancan ên din jî mehr kiribûn û her yek ji wan tenê çend rojan li ba xwe ragirtibûn û pişt re ew berdabûn. Lê ev karê han bi vê tenê jî temam nebibûn. Mîne Axa, ji bo ku jinên wî yên berdayî bi tu kesekî re nezewicin, xulamên xwe mecbûr dikirin ku bi wan kevnejinên wî re bizewicin. Şêrko bi van tevan dizanîbû û nedixwest xwîşka xwe ya nazdar, bi heya û bi namûs bi destê wî ejderhayê xwînmij ve berde. Şêrko ne tenê birayê Mirût bû, di şûna babê wê de jî bû. Babê wan çend sal bû wefat kiribû û dayîka wan jî salekê piştî mêrê xwe mala xwe ji vê dinyayê bar kiribû...

Mîne Axa destgirêdayî nedisekinî û bi bahaneyekê digeriya ku ew rojekê Mirût bibîne...

Bihar e... bihara kurdewarî heta Xwedê bixwaze xweş e. Xûre xûra çem û kaniyan, qebe qeba kewan li çiya û pesaran, stiranên bi hezar meqamanên şalûl û bilbilan, hîre hîr û destkola hespên xama yên ji zivistanê derketî li meydanan, kare kar û bare bara bizin û miyên ji hol û govan derketî yên bi hêviya çûna zozanan, hezar deng û ahengên din ên mizgîniya hatina biharê û xweşkirina pîreşivanan bi şimşal û bilûrên xwe ahenga şahî û govendan, yek di bi yekê de bi hezaran naz û xemze ve serîavêtina ciwanên nazik û sava bi rengên 3i

awa û awa li çîmen, bax, mêrg, zevî û berpalên çiyan, li qeraxên çem û kaniyan, destgirtin û li darxistina wan govend û dawetan, ew hemû aviyên ser wan ên dilop dilop dirijin ser erdê û di bin coyên avê yên sed bihên û ruh û berhênerê sergovenda

serîhildanên gulan, girtina baxên gulên ciwan bi
qure, mezintî û bi naz û nazenîn sergovendiya dawetan...
Di demsala biharê de keçên gundan revde û revde berhev
dibin û ji bo pincarên wek dûkalo, gîlaxe, siping, pincar, kereng
û ispanax ber bi daristan û qetpalên çiyan ve diçin û ber
bi êvariyê her yek ji wan bi çentik, çar û torikên xwe yên tejî
pincar ve bi dilxweşî û bi ken ber bi mal ve vedigerin.
Di wê bihara xweş de bû ku dilê Pîrût û Mirût ketibû hevûdu
û bi hezar hêviyan çaveriya payîzê bûn ku dawetê bikin.
Mirût, wê biharê ji hemû biharên borî geştir bû, siban ji
herkesê zûtir ji xew hişyar dibû û bi destexwîşkên xwe re, ji
bo ku ji pincarên biharê xwarinê ji birayê xwe re çêke, ber bi
daristan û qetpalên çiyan ve diçûn. Şêrko gelek hez ji dûkalo
û pincar yên di nav hêkeronê de sorkirî dikir. Mirût jî ji bo
xatirê kekê xwe gelek caran ev xwarin çêdikir.
Mîne Axa, wek çawan gur birçî dibe xwe li ber bizinê diqelizîne,
eynê bi wî awayî xwe li ber Mirût qelizandibû. Rojekê
bangî jina muxtêr kir û jê re got:
- Sibê Mirût hilgire û bi bahaneya berhevkirina pincaran
bibe nav daristanê. Bibe wî ciyê ku min paxan kiriye û kesek
nikare bikeve navê.
Pîrejina muxtêr, ku yeka weke sihêrbazan bû, bi demarên
destê wê yên derketî ji derve, enî û biriyên qirmiçî, rû û çavên
çîrtî li pîrhevokan diçû. Serê sibê rabû çû mala Mirût û
li tenişta wê û li ber tendûrê rûnişt. Mirût tenê li mal bû û
31
Şêrkoyê birayê wê li pê kar û kespa xwe bû. Pîrejinê piştî hinek
afixtina ser hal, kêf û sipehîtiya Mirût, dest bi pite pit û

gazindan ji halê xwe kir. Ji ber xweşmerdokiya wê wek avê rûndik ji çavên wê dibarîn, te digot belko kurê wê yê ciwan miriye. Mirût, ku bi armaca pîrejina fêlbaz û hîlekar negihîştibû, gunehê wê pê hat û jê pirsî:
- Erê, xaltiya Fatim, tu ji bo çi digrî? Xwedê neke tiştek li we qewimiye û mamê Xile te qewirandiye?
Pîrejinê hinekî din jî xwe belengaz kir û jê re got:
- Nexêr, ruhê min, ez bibim sedeqa serê te, kurê min ê ciwan bimira ji vî halê min xweştir bû ku ez tê de me. Xileyê mêrê min ji xwe tu dizanî muxtarê axa ye, bankirina xelkê gund ji bo ulama axê wezîfeya wî ye, lê gelek caran kesek bersîva wî nade û nayên ulamê. Ew jî ku bêkêfiya xwe li hemberê axa nede nîşan, ez a bêziman kiriye kerê ulamê. Çi çaxê jina axê ji bo maliştina hewşê, şûştina erd û mehfuran, şehkirina hiriyê, girtina zimhêrê, hêrana destarê, lêdana tepikan û paqijkirina dangê, bangê çend jinan bike, ji min zêdetir kesekê jê re nabîne û dibê ez bi vê pîrejiniya xwe biçim û temamê wan karan bikim û serbarê ser de jî jina axê piçek xwarin jî nade û bi bile bil û êrîşa ser Xile ve min derdixe der. Do êvarê min lê nêrî Xile gelekî bi belengazî û neçarî hat mal û piştî ku hinek ji wê avpîvaza bê rûn ku min jê re çêkiribû xwar, berê xwe da min û got: "Jinik, dibê tu sibê biçî nav daristanê û ji mala axê re pincaran berhev bikî. Min ji çend keçan re got lê kesekê bersîva min neda û jina axê jî êrîşê min kir û ji min re got ku, eger ez jê re pincaran nedim anîn dê berata min bibre û min ji kar bide avêtin..."
Pîrejin hinekî sekinî û rûndikên xwe yên derewîn malîn û bi destê xwe çilm û çîrtên ser çav û rûyê xwe paqij kirin û

33
destê xwe bi pêşka fîstanê xwe zûwa kir, nefêsek sitand û
dest bi axaftina xwe kir û got:
- Vêca ez goriya te bim, ez pîr bûme û çavên min baş nabînin,
ez hatime ji te rîca dikim ku tu bi min re bê nav daristanê
û alîkariya min bikî, hekene ez tenê bi serê xwe biçim
ez nikarim tiştekî berhev bikim û ew malwêran jî dikare me
bavêje derve û em rastê êş, derd û eziyetan bên. Vêca ez qurbana
te bim, qet nebe bila gunehê te bi xaltiya te ya pîr bê û
ez heta sax bim ez vê qenciya te jibîr nakim. Ez hêvîdar im
ku belkê Kek Ehmedê Silêman agahê te be, ewladê min...
Mirût ewqas dilnazik bû ku, bi sehkirina van gotinên xaltiya
Fatimê û bi dîtina rûndik û hêviyên wê xwe ji girînê zor
girtibû. Mirût dilê xaltiya Fatim vekirrî û got:
- Xaltî, ruhê min, xem neke. Ka ez niha tendûrê vêxim û
hinek nan pêjim û firavînê jî ji kekê xwe re çêkim, vêca em ê
çarên xwe hilgirin û biçin. Kekê min jî ji min xwest ku ez sibê
jê re pincêr sor bikim...
Xaltiya Fatimê ku li hêviya van gotinan bû, rûndikên çavên
xwe paqij kirin û got:
- Bila ruhê min qurbana te be, heta tu van bikî dê ez jî biçim
mal û serekî li zarokan bidim û bêm û pişt re emê biçin.
Lê xaltiya Fatimê di ciyê here mala xwe, raste rast berê xwe
da dîwanxaneyê. Mîne Axa nû ji enderûnê derketibû derve û
hê çav û rûyê xwe yê çîrt û diranên xwe yên zer neşuştibûn û
li eywana.ber dîwanxaneyê piyase dikir û çend xulam jî li derûdora
wî sekinîbûn. Mîne Axa ji dûr ve xaltiya Fatimê dît û
berkenek hatê. Dema ku xaltiya Fatim hat û nêzîkahiyê lê

kir, Mîne Axa ji bo ku bizane plana wî serkevtiya yan ne, bêyî
bihêle kesek pê bizane jê pirsî:
- Erê, lêêê qelişiyê, tu li çi digerî? Eger karekî te tune here
34
wê hewşiyê paqij bike, ew tejî pişkûl in.
Xaltiya Fatim bersîv da û got:
- Babê min qurbana te be, ez ê ser serê xwe bikim. Lê ez ê
niha biçim nav daristanê pincaran, ez ê sibê hewşiyê paqij bikim...
Mîne Axa têgihîst ku plana wî ser ketiye. Ew zalim, zebûn
û dilkevir ji kêfan wextî bifiriya û pên wî li erdê nediketin û
te digot seyê pêşewitî ye...
Xaltiya Fatim a 'efrît, pişt re rabû û ber bi Mirût ve çû û
dema ku gihîşt li wir Mirût mêzera xwe girêdabû û çara wê li
ser milan bû.
Herdu bi hev re ber bi daristanê ve ketin rê.
Ew kilama li ser mêzerê hebû gelek li wê keça ciwan û sipehî
dihat û xeyrê îxtiyarî ew kilam hat ser devê wê û dest
pê kir û got:
Mêzera sor û şîn yî
Şermendeyê deriyê Xwedê yî
Serî hilde bê bela bî
Mêzera çend rengîn e
Perçeya wek rengê hingvîn e
Rûyê xwe bide me dil xemgîn e
Mêzera sor û şîn e
Agir min girtiye gelek bêdîn e
Dil eynik e û xwe tê de bibîn e
Mîrûta şox û şeng, nazdar, sipehî, dilpak û ya bi armancek

dahatû, bi xaltiya Fatim a rafizî, dilreş û mel'ûn nêzîkî daris-
35
tanê bûn û ber bi wê mintiqê ve çûn ku bi taybetî ji bo mala axê hatibû paxan kirin.
Mirûta fêqîr ku bi hezkirina Pîrût taze tama şêrîniya vê dinyaya han tam kiribû, ji bilî wêne û dilê Pîrût ku, di hindurê dilê wê de cî girtibû, riya tu tiştekî din nedida ku bipeke û bikeve hindurê dilê wê. Wê wek zarokên sava bi çavê zaroktiyê li dinyayê dinihêrî û tenê Pîrût di dilê wê de hebû ku bûbû hêz û taqet jê re û ji jiyana wî pê ve nedikarî fikra tiştekî din bike û bizane ew kevnerafiziya teniştê wê çi davikek li ber wê vedaye.
Pîrejinê bi zanetî, ji bo ku wext derbaz be û tarî ser de bê, gelekî hêdî dimeşiya û car caran jî li ser kevirekî rûdinişt û "bîhna xwe vedida". Dema ku gihîşt navçeya paxankirî ku xaltiya Fatimê ji şeş-heft deqîqan carekê qevdek pincar diçinî, bi sed û ax û daxan li ser pîrîtî û qedera xwe xeber dida.
Roj gelekî ji qamê nîvroyê derbaz bibû. Gavan, avder, cotkar, nator û xebatkerên deştê êdî ber bi gund ve vedigeriyan; deşt, bax û mezra hêdî hêdî vala dibûn. Pîrejinê li milê aliyê rojavayê nêrî û ji dûr ve dît ku mirovekî siwarî ber bi aliyê daristanê ve tê û di cî de zanî ku ew siwar Mîne Axa ye. Ji bo ku pîrejin xwe ji ber çavan wenda bike, berê xwe da Mirût û got:
- Mirûta ruhê min, ez ê qasekê biçim ser wê ava xwarê, li hêviya min bisekine û ez ê bêm û pişt re em ê biçin gund, êdî wext dereng e...
Gelek bi ser de neçû, mirovê siwarî nêzîkî daristanê bû.

Mîne Axa çawan çavê wî bi Mirût ket, xwe li nezanînê danî
û gazî kir:
- Keçê, tu tenê bi serê xwe vê wextê şevê li vir çi dikî? Çawan
ciwanên wek te bi tenê serê xwe bên vir. Welleh însan
36
gelek 'ecêb in, hirçên dirinde jî te bibînin dikarin aşiqê te bibin
û te birevînin.
Mirût, ku heta wê çaxê tu wextê Mîne Axa evqas ji nêzîk
ve nedîtibû û tenê dengê wî sehkiribû, serê xwe kir ber xwe
û dilop û dilop xwîdan jê diweriya. Wê pêşka destmala serê
xwe da ber devê xwe û bi dengekî nizm bersîva axa da û got:
- Qurban, ez bi jina muxtar re hatime û emê ji maliya axa
re pincêr berhev bikin. Dê niha jina axê jî vegere.
Guhên Mîna axa qet ne li van gotinan bûn. Ew gotin weke
bayê li ber guhên wî re derbaz bûn. Wî xwe nêzîkî Mirût
kir û got:
- Nexêr, nabe ez te tenê li vir bihêlim.
Mîna Axa ev go, ji hespê xwe peya bû, ber bi Mirût ve çû
û jê re got:
- Dê ka em herin, vir tejî tirs û belan ye, dema ku tarî dibe
ev der tejî cenewar dibin.
Şewatê ber qirika Mîne Axa girtibû, wextî nefes lê biçikanda
û temamê demarên bedena wî di nav gerê de bûn. Lêv,
dest, ejnî û ranên wî wek tîra subhanê dilerizîn. Mîne Axa
nêzîkî Mirût bû û xwest bi milê wê bigre. Lê ji bo ku heta
wê çaxê hê bi fêlên axa nehesiyabû û heta wê seetê destê tu
nemehremekî bi destê wê neketibû, xwe paş de kêşa û got:
- Qurban, hûn siwar bin û bikevin pêsî û dê ez ê jî gaziyê

xaltiya Fatimê bikim û em ê li dûv we bên.
Mîne Axa hevsarê hespê xwe bi çiqa darekî ve girê da û wek çawan hirç êrîşê nêçîra xwe dike, bi wî awayî êrîşê ser Mirût kir û bi awakî şidayî ew himbêz kir. Mirût êdî mebesta wî fehm kiribû û çiqas jê hat li Mîne Axa qêjiya û jê re got:
- Min berde hey sebabê wiha wiha lê kirî, bêşerefê bêheya,
37
min berde. Ez ne ji wan im ku tu xeyal dikî.
Mirût bi van gotinan û bi dest û piyan hewil da ku xwe ji destê wî berazê çiyê rizgar bike. Her te digot kevoka ber pençê başokê ye û aska ber kilpên gorê ye qajîn û hawarê dike.
Lê qajîn û hawara wê aska nazdar ji destê wî seyê har bêfeyde bû û çiqas diçû axa destê xwe hê zêdetir li navtenga Mirût digerand, qahîm dikir û xwe bi xwe digot:
- Ne, ne tu ji destê min xelas nabî, ciwanên sipehî û nazikên wek te tenê ji axan re helal in. Heyf e tu bikevî destê kurmancekî reş ê genî.
Mîne Axa bi awakî wisan bi Mirût girt û givaşt ku taqet jê birî. Ji bo qêjîn û hawarê neke, bi lez piştîniya xwe ji pişta xwe vekir û herdu destên Mirût pê girêdan û egala rêşîkirî ya ber piştîniyê jî derxist û ji ber zarîn û axînê ku dengê wê neçe ciyekî danî ser devan û pişt re danî erdê...
Mirût bi dengekî temirî dikir hawar û ji bo alîkariyê bangî evîndarê xwe dikir:
- Ax Pîrût, tu li ku yî ku tu min ji destê vî sebabî xelas nakî!
Êdî asîman tarî bûbû, nerm û nerm baran dibarî. Her te digot asîman jî ji halê vê keça çavxezal, nazik û nazdara ku

ketiye erdê û ji xwe çûye re ketiye kula girînê û jê re rûndikan diwerîne. Mirût piştî qederekê ku hişê wê hat serî, li çaraliyê xwe nêrî û zanî ku wî heramzadeyê karê xerap pê re kiriye û herdu destên xwe li nav serê xwe da û dest bi zarînê kir. Di vî halî de tenê fikra kuştina xwe kir û di dilê xwe de got: "Nexêr, êdî jiyan li min tehl e û ji min re nabe. Keça kurd her wextê serbilind, bi heya û namûs jiya ye û mezintirîn serbilindiya keça kurd jî her ev e. Lê êdî ez ji vê serbilindiyê mehrûm im. Êdî ez çawan dikarim li xelkê binêrim û ez
3»
ê bi çi rûyî mêr bikim. Ez bi sî cuziyên Qur'anê jî sond bixwim kes ji min bawer nake. Ez ne girîng im, dê heyayê birayê min jî biçe...". Mirût di dilê xwe de ev gotin digot, rûndikên çavan dirêt û di serê xwe de difikirî ku dê çawan xwe helak bike. Pîrût hat ber çavê wê û di dilê xwe de got: "Ax Pîrût, ez çiqas hez ji te dikim. Lê heya û namûsa keça kurd nehişt ez evîniya xwe nîşanê te bidim. Tu bi Xwedê kî çi keçê şûna min de bûya dê eynê tişt bikira. Tu nizanî min li mal çiqas kum, gore û destmal jê re çinîbûn. Bila Xwedê keçeka xweşbext bike bextê te, xweziya min bi wê ku...".
Mirût ewqas giriya û li xwe xist ku, êdî rûndikên çavên wê hişk bûbûn û dilop dilop xwîn ji çavên wê diwerîn. Asîman jî, hercarê ku çavê wê bi dilopên xwînî yên çavên wê şox û şengê yên wek libên hinarê diket, zêdetir di ewran de diwemilî û wek dîzmencela tejî av a serjêrkirî rûndikan dirêt.
Mirût, êdî di dilê xwe de biryar dabû ku xwe bixeniqîne û ji destê ezab û eziyeta ruhê xwe xelas bibe. Çunkê dizanî ku li hemberê'zulm û zordariya axa, ne bi xwe, ne Şêrkoyê birayê

wê û ne jî Pîrûtê evîndarê wê yê yekane ji destên wan tiştek nayê. Eger ji ber zulma destê axa şikayeta wî li dewletê bikin feyde nake û dikarin bi xwe malwêran bibin. Fermanderê jerdirman dikare bi sedan bahanan bi wan re bigre û di dawiyê de cardin ew qerzdar derkevin, ji xwe axa jî ji wan kesan nîn e ku guhê xwe bide seyîd û melayan.
Mirût, çiqas difikirî hê ewqas zêdetir baweriya xwe bi rastiya biryara xwe dianî û ji xwexeniqandinê pê ve tu riyeke din nedidît. Ji ber vê, Mirût rabû û piştîniya xwe ji xwe kir. Serek wê bi darê aland û serê din jî kir heleq û nefesa jiyana xwe ya dawîn bi van gotinên di dilê xwe de temam kir:
"'Omrê min qurbana te be birayê min ê delal, tu hêvî bû ku
39
tu min bidî mêr û ji xwe re jinekê bînî. Lê hêviya te nehat cî, ez nizanim ji vir şûn de dê tu bi kîjan riyê bizewicî...
"Ez ji te re kor bim kekê min ê giyan, tu li hêvî bû ku ez sibê ji te re qazyaxe sor bikim, ez ji te re kerr û lal bim...."
Şêrko li mal rûniştibû û çaveriya xwîşka xwe bû. Di pê hev de diçû hewşa xanî û divegeriya û dema ku baranê dest pê kir hê zêdetir nerehet bû û êdî bîhn û nefês lê çikiyabû. Şêrko, ji kerba xwîşka xwe êdî nekarî xwe zêde li mal ragire, rabû û ket nav gund û serî li hemû ew malên ku xwîşka wî diçû û keçên wan destexwîşkên Mirût bûn da. Li Kanîkîseleyê êdî malek nemabû ku Şêrko neçe û pirsa xwîşka xwe neke. Ji bilî xaltiya Fatim pê ve kesekî nedizanî û wê jî ji tirsa axa lêvên xwe ji ser hev ranedikirin. Şêrko qet cewab û saloxek bi dest nexist û bi naçarî paşde vegeriya mal. Ewqas baweriya wî bi evîndariya Pîrût û Mirût hebû ku, qet nediket bîrê ku

Pîrût ew revandibe, lê ji ber bêçaretiyê car caran ew jî diket îrawi...
Wê şevê heta sibê xew neket çavên Şêrko û wek dînan lê hatibû. Tariya sibê rabû û cardin ket nav gund, lê cardin serûşûnek bi destan neket. Şêrko cardin vegeriya mal û ket nav eşyayên xwîşka xwe û dît ku cil û bergên wê yên nû kum, kulav, lepik û hemû cihêzên wê di ciyê xwe de ne, êdî bi temamî dilê wî ser rûnişt ku xwîşka wî bi Pîrût re nereviyaye.
Dema ku hinek din li derûdora xwe nêrî, dît ku di nav eşyayên malê de çarik û adek naxuyên û di cî de ket bîrê ku ji xwîşka xwe re gotibû jê re pincar sor bike, hebe tunebe xwîşka wî do çûye nav daristanê ji bo wî pincar berhev bike. Şêr-
40
ko bi vê fikrê ji nişka ve da xwe rabû û bi bez ber bi daristanê ve çû. Piştî lêgerîneke gelek zêde, ji dûr ve reşaya însanekî ber çavên wî ket ku, te digot li binê darekê sekiniye destê xwe dirêjê çikên darê dike. Şêrko çawan ev dît, di cî de dest bi qêrîn û hawarê kir û got: "Erê, way way li min Mirût!". Çend carên din jî qêrîn û hawar kir, lê tu bersîv negirt. Êdî bi bazdanê nêzîkî wê darê bûbû û cendekê xwîşka wî ya bi darê ve aliqandî dihat dîtin. Şêrko bawer kir hê xwîşka wî sax e, bi lez girêka piştîniyê ji darê vekir û çend caran bangî Mirût kir, lê tu deng ji Mirût derneket. Li ser vê çiqas ji Şêrko hat kir borîn û dest pê kir dest û rûyê xwîşka xwe yên cemidî maçî kir. Piştî têr girîn û lixwexistinê, Şêrko serê xwe rakir û li derûdora xwe nêrî û berî hemû tiştî serokê cigara germîn û şûna nalên heywenekî ber çavê wî ketin...
Şêrko cenazeyê xwîşka xwe danî ser herdu destên xwe û

ber bi avahiyan ve vegeriya. Hemû xelkê Kanîkîseleyê derketibûn derve û li wê ciwanê dinihêrîn, tevan bi hev re dest bi borîniyê kirin.
Destexwîşkeke Mirût a herî nêzîk ku keça cotkarekî dewlemend bû, hêvî û lavayan li birayê xwe kir ku biçe gundê Kanîsewzeyê pê Pîrût ve. Ew jî çû û bêyî tiştekî ji Pîrût re bêje, ew anî Kanîkîseleyê. Dema ku Pîrût gihîşt Kanîkîseleyê êdî xelk ji ser mexberan vegeriyabûn, li gor urf û adetan tenê mirovên meyt yên nêzîk, yanê Şêrko li binê kêla xwîşka xwe mabû.
Dema ku Pîrût ji Zêno ber bi malan ve ser ket û Kanîkîsele hat dîtin, tevzek di bedena wî de hat xwarê, dilê wî dest bi lêdanê kir, rengê wî bizirî, devê wî zûwa bû û bi lez berê xwe da mala Şêrko. Ew pîrejin, keç û zarokên ku li wir berhev bûbûn, bi dengekî nizm jê re gotin:
4i
- Şêrko li ser mexberan e...
Pîrût berepaş ber bi mexberan ve çû û dema ku gihîşt wir, dît ku Şêrko rûniştiye û kêlek himbêz kiriye. Pîrût xwe li sitoyê Şêrko gerand û jê pirsî:
- Çi qewîmiye lo, ka bêje ez jî bizanim, ez ji kerban mirim?
Bi kelegirîn û bi axînek kûr ve got:
- Way çû çûû, xwîşka min çû...
Dema ku Pîrût ew gotin seh kirin, dinya bi ser de hilweşiya û xwe avêt ser mexbera Mirût û dest bi borîniyê kir, bi dengê xwe yê xweş dest bi şîn û reşayê kir û çend ferdên sitrana Xecê û Siyabend bi wan çavên xwe yên tejî rûndik ve gotin:

"Singê te yê spî nerm û newal, soregulê jêkim Xecê giyanî,
Taqe gula bîhnxweş a Zerza û Mukriyanî,
Derdê min bû derdekî zêde giranî,
Xewna min rast derket ku gotine her dar derdê darê dizanî,
Xecê giyan, ez nemînim ji bo wê ciwanî,
. Hey eman, hayê eman ji te re nemînim Xecê gerdûn bi xalî,
Ay, yayê, yayêyêyêyê çû...
Xecê ciwanê, çeleng kebanî... of, of derdekî bê emanî,
Va roj U min sekiniye li mehelê danê taştî
Melekê mewtê hariye ser nazikê bi giyan kêsanî
Ax... ax ez çi bikim! nemaye dema desdiildan û cengê liberxwedanî,
Ax destê min nagere çengê ger û marî û qevda xencera debanî,
Ez ji bo te bigerim ser û binê welatê kurmancetî û şeş dangê kevnemeydanî,
Diqîrim ka dijmin û ew kesê gora min dizî kanî,
Ew siwarê bi lez ber bi min ve tê bihingivim ji dûr ve bişkînim nîşa-
41
ni,
Yan siwarê mehîna kûmêt, hespê şê û kehêlan bim û dij rawesrim bi darê cirîtê, teqle û rimbazî,
Yar bibîne zorevanî,
Ay, ayyê, yayêyêyê çû...
Vê carê yên harin serê mêr û jinên dûrnas û zozanî,
Lew û cihêlên siwarî, nêr û mê, ciwanên pak û xortên bajarî,
Zarok û mendalên rûniştiyên temamê herêm û welatan dîrin ew serketin û derketina yekê qehremanê axa Mukriyanî,
Tu xem ser dilê min tunebû ji bilî derdê dûbûnî,
Yan xwe ji nemana merg û jiyanî,

Ji bilî xema evîndara xwe sorgula xwe benda dilê xwe,
Yanê Xeca giyanî,
Of, ofji destê zeman û rûreşiya dewranî...
Ay, yayê, yayêyêyê çû...".
Pîrût her digot û didomand. Şêrko dixwest li ber dilê Pîrût bikeve. Pîrût jî hewil dida dilê Şêrko bivekirre. Êdî tarî daketibû. Ew herdu xortên sava wek zarokan digiriyan û bi ser xwe ve hatin ji wan re tunebû. Pişt re ser û milê wan ber bi wan ve û bi çavên xwe yên ji xwînê sorbûyî hêdî hêdî ber bi mal ve vegeriyan. Xelkên gund revde revde dihatin serxweşiyê û çengşikestî vedîgeriyan.
Dar û berên Kanîkîseleyê jî ketibûn şîna wê ciwanê. Tem, mij û xubar temamê asîmanê Kanîkîseleyê dagirtibû.
Pîrût û Şêrko tenê li mal mabûn. Xew û xwarin li wan heram bûbû. Bêdeng pala xwe dabûn henzêlê û rûniştibûn. Pîrût, ji bo hê agahê wî ji tiştekî tunebû, dixwest bizane ku çi lê hat gula sor a hindurê dilê wî ji nişkave mir. Lê dilê wî dest nedida û bi xwe re nedidît ku ji Şêrko bipirse. Şêrko tê-
43
gihîşt ku Pîrût gelek hez dike bizane ka çi qewimiye. Ji ber vê, ji ciyê xwe rabû û çû rexê wî rûnişt û yên ku dizanî jê re gotin. Şêrko got:
- Birayê min, li wî ciyê ku vê ciwana han xwe daliqandibû, min qûnika cigarekê dît û ciyê simê hespê jî kifş bû. Bi Xwedê li vî gund ji Mîne Axa pê ve kesek cigara germanî nakêşe. Wî sebabê çend caran mirov şandin ba min û xwîşka min ji min da xwestin. Lê min tu bersîv nedayê û gelek jî mirovekî dêwîn pîs e, bêşik sebebê xwîna xwîşka min ew e...

Dema ku Pîrût ev sehkirin, gotina Şêrko birî û got:
- Wellehî ez ê niha biçim û bi dirganê hûrê wî bidirînim...
- Ne Pîrût, niha tu nikarî bi heqê wî bê derê û nabe em xwe nîşan bidin ku şika me li ser wî ye û qatilê cannazika me ew e. Hekene dê em jî bibetilin û em nikarin qet tola xwe jî jê vekin. Niha ew siwar e û em peya ne, eger bi xwe jî nekare tiştekî bi me bike, bi destê fêrmanderê jerndirman ku bi sedan benan bi hev ve girêdayî ne, dikare navê qaçaxçîtî û diziyê bi me ve deyne û toz û dûmana me bavêje. Ka bisekine, Xwedê ji Sultan Mehmur mezintir e. Kar tune ku Xwedê baş neke. Ev dinya han her wiha nabe, emê dereng an zû tolaxwe vekin...
Pîrût ku gelekî mat bûbû û bi dil guhê xwe didan gotinên Şêrko, bi sehkirina gotina "tolevekirinê" da xwe rabû û wê Qur'ana kevin a ji melayê Kanîkîsele mabû, ji ser hinzêlê anî xwarê, danî pêşiya Şêrko û got:
- Wellahî, webîllahî û wetîllahî, bi sî cuziyên vê Qur'ana han ez sond dixwim ku kengê tivingek bi destê min bikeve, ji bo vekirina tola Mirût ez ê gulleya wê ya yekê berdim singê vî sebabê han...
44
Çerxa zemanê jî te digot li gor daxwaz û hêviyên wan herdu xortan dizîvirî. Bihar derbaz bû û qirçe-qirça havîna sala i94ian bi tîrêjên xwe welatê kurdan gerim kir. Piştî bîst salên dîktatoriya reş a Riza Xan cara yekê di wê havînê de cejna kurdî ya mezin hat pîroz kirin. Gelê Kurdistanê tiving, dabance û şeştîr bidest xist. Ji gelekî bindest, zorlêkirî û dilşewitî re, ji desucevtina çek xweştir tiştekî din tune...

Her bi derketina firokên reş ji asoyê milê bakur, ordiya Şahînşahî wek tu qemçek nok bavêjî erdê wisan belav kir. Ew xortên gundî yên ku bi zorê biribûn eskeriyê û ji destê zabitên xwînxwar hatibûn emanê, bi dilxweşî û şadî bi bîranîna gelê xwe pêşwaziyê bi hatina firokên reş kirin û halla-hallaya wan bû, bi awakî zû cil û bergên xwe yên îcbarî ji xwe kirin û çûn ba kes û nasên xwe. Ew beşa ordiyê ya li Kurdistanê bicî kiribûn belav kirin û beşa piraniya ew çek û cebirxanên wan ketin destê kurdan. Gelek kesên wisan hebûn ku bi satilek mast, du nanan, qutiyek tutin û çend qiranan tiving û dabance ji eskeran distandin.

Dema ku beşa ordiyê ya Seqiz têkelhev bû, hejmarek ji zabitên wê gelekî ji xwe ditirsiyan. Çunkê di muddetê demên mayîna xwe yên li Seqizê de, xerabiyeke gelek zêde li gel eskerên ku kurd bûn kiribûn. Ew di wê hewlê de bûn ku bi çi awayî dibe bila bibe bi sax û selamet xwe bigihînin Tehranê.

Ji bo vî karê han jî temamê hêviya wan Qerenî Axa yê Kanîsewzeyî bû. Wan dixwestin xwe bigehînin Kanîsewzeyê, li wir cil û bergên xwe biguherînin û bi riya Tîkan Tepe ya Hawşar û Bêcar re ber bi Tehranê ve biçin. Ew zabitên ku xwe bi Qerenî Axa girtibûn ku di vî karî de alîkariya wan bi-

45

ke, soz lê dabûn ku di muqabilê vê de otomobîlên xwe, çend tivingên birno û çend damancên berebullum bidin wî û bi ser vê de sozek din jî dabûn Qerenî Axa ku, ew çawan bigihîjin ciyê xwe ji Heme Riza Xan madalyayek jê re bisrînin.

Qerenî Axa, bi tayberî, sitandina wê madalyê ji xwe re serbilindiyeke mezin dizanî û di dilê xwe de digot: "Welle, di nav

axayên kurd de yê cara yekê ji destê wî paşazadeyê mubarek ku madalye werdigre ez im û dê temamê kurdan bexîliyê ji min bikin... Vêca qurban, dema ku ez wê madalyê bi singê xwe ve bikim, ez wê çaxê paşan jî xulamê xwe nahesibînim...". Qerenî Axa, piştî ku qewlê alîkariyê dabû wan zabitan, çend kes ji xulamên xwe agahdar kiribû û ji wan re gotibû ku, dibê wan zabitan bi saxî û selametî bigihînin Tîkan Tepe, eger tiştek bê serê wan an mûyek jî ji wan kêm be, bila êdî ber çavê wî nekevin. Van xulaman jî, ji bo ku li hemberê xulamên din xwe kêrhatî bidin nîşan, xwe qure û kubar dikirin û digotin: "Baweriya axê gelek bi me heye û ji nav tevan ji bo vî karê bitirs wî em bijartine...". Hêdî hêdî behsa hatina çend zabitên Iranî ji Seqiz a Kanîsewzeyê di nav temamê gund de belav bûbû.

Hejmarek zêde xortên Kanîsewzeyê eskerî kiribûn û li wir ji destê zabitan 'ezab û eziyetek gelek zêde dîtibûn û çend kes ji wan jî ji eskeriyê nevegeriyabûn û bêser û bêşûn wenda bûbûn. Hinek ji wan xortan sehkiribûn ku dê çend zabit ji Seqiz bên Kanîsewzeyê. Li ser vê, li hev kiribûn ku biçin riya wan bibirin û tolê ji wan vekin û wan bişêlînin. Vêca ji ber vê, ew xort çûn li ba Pîrût û xwestin ku wî jî bi xwe re bibin. Çunkê zexmî û zîrektiya Pîrût dikarîbû gelek alîkariya wan bike. Dema ku Pîrût daxwaza alîkarî û beşdariya bi wan re ji

46

hevalên xwe yên gund seh kir, di cî de destxistina tivingê û tolevekirina ji Mîne Axa hat ber çavê wî û teklîfa wan qebûl kir. Pîrût bû serokê wan xortan. Bi riya xulamên axê pê agahdar bû ku dê sibe êvarê ew zabit bi makînê ji Seqiz bên

Kanîkîseleyê. Ji bo ku plana wî bi ser bikeve hevalên xwe berhev kirin û ji wan re got ku, dibê em ji niha de biçin rê kontrol bikin û bizanin ka emê li kîjan ciyê rê li wan bigrin. Berbanga êvarê Pîrût bi pênc kesên din ve ber bi riya Seqizê ve ketin rê. Sê çarîk seet ji Kanîsewze wêdatir, rê di nav şîv û newalekê re derbaz dibû. Ji herdu milan jî serê çiyan gihiştibûn asîmanan û wek selên mezin dihatin ber çav. Ji wir ve tu avahiyek nedihat dîtin û teqandinek jî çêbûya deng dûr nediçû. Li Pîrût ev ciyê han ji hemû ciyên din baştir hat xuyakirin. Ji hevalên xwe re got ku emê sibe êvarê karê xwe li vir bikin.

Roja din êvarê, Pîrût û pênc hevalên xwe her yek ji wan ji milekî ve ji nav avahiyan derketin û dûr ji çavan li hev berhevbûn. Ew şeş kes bûn û sîlahên wan jî: tivingek pênçtîr a jengarî ya zemanê Şêx û canbêzareke kevin a dewra Xalo Qurban bûn. Ev herdu tivingên han jî di seranserê dewra dîktatoriya Riza Xan de ji aliyê gundiyan ve di nav kulavan de hatibûn pêçandin û kiribûn bin arîkên xaniyekî. Ji bilî van tivingan, xencer, necax û dirgan bi wan re hebûn.Bi Pîrût re jî xencerek debanî hebû.

Dema ku gihîştin şîveyê tariya şevê bi temamî dinyayê girtibû. Bêsekin pangoran gilêlê ser rê kirin û rêzekevirek seranserê rê raxistin. Du kesan li milekî rê û sê kesin din jî li milê din yê rê xwe li ber kevir û hafan veşartin. Yekî din jî şandin ser Zêno ku dema lambên ereba wan bixuyê, kevirekî gilêl bike û îşeratê bide hevalên xwe. Ji bo ku neyên naskirin ser û

47

rûyên xwe pêçan û tenê hindavê çavê wan dihat dîtin.

Pîrût, di 'omrê xwe de cara yekê bû ku rêbirî dikir û dizanî
ku ev karekî gelek bitirse. Lê destxistina tivingê û kerba tolevekirina
evîndara xwe ya nazik û nazenîn dilê wî wisan rakiribû
ku, te digot li ber wê selê û di vê şeva tarî û zilmat de ji
bo şer û xwînrijiyê xwe neqelizandiye, belko dema nimêja
nîvroyê ye û li ber çemê Seqizê pal daye û bi kêfa dilê xwe
tora xwe avêtiye çem û masiyan digre...
Serheng (albay) Xwocendî yê serokê serkantî ya beşa ordiya
îranê ya li Seqiz, hê ji destpêka serê wê salê ve jin û zarokên
xwe şandibûn Tehranê û ew roja beşa ordiyê ya li Seqiz
belav bûbû, hemû eşya û hûr û mûrên xwe kiribûn çenteyan
û li fersetekê digeriya ku rojekê zû bi destan bikeve. Êdî ew
firset bi dest ketibû û xizmeta Qerenî Axa ya bikêr dilê Xwocendî
geş kiribû. Xwocendî serê sibê zû ji xew rabû û çente
dan hev û bi taybetî tiştên antîke û biqîmet bi awakî qahîm
di biniya hemû tiştan de bicî kir, riyê xwe kur kir û li ser
kursiyê rûnişt. Sergord (bînbaşi) ê alîkar û du zabitên din li
ba wî rûniştibûn û bi xwarina berqene mijûl bûn. Bi ber
nanxwarinê re Xwocendî berê xwe da zabitên din û bi ken ji
wan re got:
- Dê ka em vê carê jî penîr, torax û şîrê Kurdistanê bixwin,
Xwedê dizane belkî em êdî qet nevegerin vir. Ez li ser
navê xwe bi xwe dibêjin, eger ez careke din vegerim vir, ev
şaşiyek mezin e...
Ew roj li Xwocendî û hevalên wî wek sed rojan hat. Çiqas
piyase dikirin û diaxiftin jî qet roj nediçû ava. Belê, ew dema
ku bêsebir li hêviyê bûn hat gihîşt. Tu esker li ba wan zabitan
nemabûn ku makînê ji wan re bajon, vêca ji ber vê, her

çendîn ajotina makînê ji bînbaşî re 'eyb û sernizmî bû, lê
48
mecbur ma li pişt dîreksiyona makînê rûne. Zabitên din
çente li pişt makînê bicî kirin, çend tiving û tabanceyên zêde
bi xwe re birin. Serheng li rexê sergord û herdu zabitên din jî
li piştê siwar bûn û ketin rê.
Vêca dê were lê binêre; ew zabitên Şahînşanî ku ji xerabî û
dijminatiyê pê ve tu karekî din ji kurdan re nekiribûn, di vê
tariya şevê de û di nav çiya û geliyên Kurdistanê re li ber çavê
çekdarên kurd re derbaz bibin. Ya Xwedê, di wî halî de
kafir jî di halê wan de nebe...
Lêvên serheng û yên hevalên wî nedilepitîn, her çendîn rê
bi kevir jî bûn, lê cardin yawer bi zorê makîne diajot.
Rengê Xwocendî û yên hevalên wî wek cawê spî lê hatibû.
Di vî halê han de temamên ew xerabiyên nemirovane yên bi
eskerên kurd re kiribûn wek şerîtê sînemayê ber çavê wan re
dihat û diçû.
Ew xortên kurd ên gundî ku bi zorê dibirin eskeriyê, hê ji
roja yekê ve, ji ber ku bi farisî nedizanîn, diketin ber şeqam,
qamçî û dijûnên zabitên faris. Çunkê ew fermanên ku ji wan
re didan fehm nedikirin. Mesela eger zabitan fermana "tiving
ser mil!" bidana, eskerên kurd tivingên xwe datanîn erdê,
yan dema ku fermana "ber bi paş vegere!" bidana, yên
kurd rû bi rûyê wan disekinîn û... Vêca çi eskerê yek ji van
şaşiyan bikira, cezayê lêdana pêncî qamçiyan jê re dihat dan
û li pêşberê hemû eskerên din radizandin erdê û lê dixistin.
Vêca ji ber vê, xortên kurdan her ji roja yekê ya eskeriya
xwe ve her di fikra firarkirinê de bûn û li firsetekê digeriyan

ku ji wê eziyet, zulm û sivikatiyê rizgar bibin. Dema eskerekî bi çekê xwe ve firar bikira, cezayê wî gullebarankirin bû û wextê dihat girtin li ber çavê eskerên din dihat gullebaran kirin. Vêca di wê muddetê de ku Xwocendî fermanderê şaxê
49
ordiyê ya Seqizê bû, çend xortên kurd ên ku bi çekên xwe ve fîrar kiribûn û çûbûn Kurdistana Iraqê û li wir polîsên Melik ew girtibûn û teslîmê îranê kiribûn. Xwocendî bi xwe fermana gullebarankirina wan xortan îmza kiribû...
Ji bilî vê, Xwocendî derbeyek jî li axayên derûdora Seqizê dabû ku gur neyne serê bizinê. Wî bi zorê tevan mecbûr kiribû ku biçin li bajaran bijîn û her axayekî bi ciyekî ve leqandibû û ev jî awayekî din yê surgunkirina axayên Kurdistanê bû. Begzadeyên Feyzûllah Begî ku li derûdora Seqizê dijiyan, belavê Urmê, Tebrîz, Şîraz û Kirman kiribûn û Serheng Xwocendî piraniya beşa malê wan talan kiribû û ji wan bi sedan û bi hezaran tumen bertîl sitandibû.
Serheng Xwocendî, serokê Eşîreta Dîbûqrî girtibû û biribû Seqiz û di orta nîvroyê wextê nimêjê kapek kiribû sitoyê wî û ew di nav bajêr de gerandibû. Ev sivakatî û nemirovatî qet ji bira Eşîreta Dîbûqrî neçûbû. Di nav vê eşîretê de tenê Qerenî Axayê Kanîsewze li ser riya ku hukumeta îranê dabû pêşî dimeşiya û ji Heme Riza Şah re nûkerî dikir...
Zabitên din ên li ba serheng Xwocendî jî, her yek ji wan kirinên xwe yên xerab ên di derheqê gelê Kurdistanê de dianîn ber çavên xwe û tirs û lerz bi giyana wan diket. Di wê demê de te digot ev zabitên han di seranserê 'omrê xwe de cara yekê ye hîs pê kirine ku dibê li hemberê ew hemû xerabî

û necamêriyên ku kirine li bersîvê bigerin. Serheng û hevalên wî, ji bo mij û mûrana ber çav û nav mejiyê xwe bidin milekî, cigare ser cigarê vêdixistin û Xwedê Xwedê digotin ku dengê 'ewtîna san seh bikin û ew dilê wan xweş bike ku gihîştîne avahiyan. Lê gelek bi ser de neçû hêviya wan di binê lingêv wan de ma...

Navek re, ku sergord makîne bi tundî diajot û çavên xwe

50

kiribûn rê, ji nişkave qêriya:

- Ya Ebû'l-Fezlê 'Ebbas, rê birîne!

Sergord ev got û bi lez lambên makîneyê tefandin. Tam vê navê re çend gulle teqiyan, sergord makînê sekinand û her çar zabit bêsekin hatin xwarê û her yekî xwe avêt milekî. Wê navê re çend gulleyên din jî ber bi makînê ve hatin avêtin. Lê kurdan dîtin ku ji aliyê zabitan ve qet gulle nayên avêtin, wisan zanîn ku tevan kuştine yan birîndar kirine. Pîrût bi hevalekî xwe re hêdî hêdî ber bi makînê ve hat.

Di wê tariya şevê de çav çavan nedidît, tenê makîne wek reşeyek mezin ji nêzîk ve dihat dîtin. Xwocendî, ku li milê çepê yê makînê li berpala çiyê xwe li binê kevirekî qelizandibû, ji nişka ve dît ku yek ji wan rêgiran li teniştê wî ye û dixwaze ber bi makînê ve biçe, bi lez berê lûla tabanca xwe lê rast kir û tiliya xwe da ser tetikê. Pîrût ku di pê wî de dihat, dît ku hevalê wî birîndar bû, dest avêt xencera xwe û yek li ser dilê Xwocendî xist. Tenê dengek ji Xwocendî derket û got: "ayê wayê mordem..."

Kurdên din bi bihîstîna teqîna tabancê, wisan zanîn ku zabit xweparastiniyê dikin û xwe nadin dest, bêyî ku bizanin

ber bi ku ve diavêjin, çend gulleyên din jî teqandin. Hawar
û waweylaya Xwocendî û teqandina çend gulleyên din, zabit
hê zêditir kirin nav tirs û xofê, wan xwe bi teqle û gilêlkirinê
ji rê dûr xistin û bêyî ku bizanin ber bi ku ve diçin ketin riya
çiyan...
Kurdan, xwe li ser singê xwe xuşilandî nêzîkî makînê kirin
û ji bo ku makîne ji ciyê xwe nelepite çend xencer li tekelê
wê xistin û kûn-kûn kirin. Pîrût bi destê çepê deriyê makînê
vekir û bi destê rastê serê xencerê ber bi hindurê makîn ve
girtûgot:
5»
- Seyo teslîm!
Tu deng ji nav makînê nehat. Kurdan ku zanîn kesek tê de
tune, derketin ser û çi tiştên tê de hebûn hemû sitandin û
hetta fişekek jî tê de nehiştin. Pîrût bi alîkariya hevalên xwe
yên din hevalê xwe yê birîndar hilda û danî ser milê xwe û
hêdî hêdî ji rê dûr ketin.
Ji ew tiştên ku ketin destê wan, Pîrût tenê du tivingên birno
yên dirêj û bi dused fişekan ve hilgirt û ji tirsa kek Mamendê
babê xwe newêriya bibe mal û berê xwe da nav çandiniya
xwe û tiving û fişek di nav gidîşên genim de veşartin
û vegeriya mal. Êdî şev nîvî bûbû û temamê xelkê gund raketibûn,
tenê se hîşyar bûn ku car caran direyiyan û bêdengiya
şevê xera dikirin. Pîrût çawan gihîşt mal, çû û ket nav
ciyê xwe yê serbanê. Lê ji bidestxistina tivingan ewqas dilxweş
bû ku xew nediket çavên wî û temamê fikir û bîra wî li
derûdora tolevekirina ji Mîne Axa diçû û dihat û di dilê xwe
de digot: "Ez bi Kelamûllah sond dixwim ku ez ê gulleya tivinga

xwe ya yekê berdim singê wî mizawirê û ez heta sonda
xwe bicî neynim ez gulleyekê pê navêjim...".
Di tariya beyana sibê de hê Pîrût nîvxewî, bo qêr û hawara
gavanan û xwe bi xwe diqêriyan û digotin: "garan diçe, ker
man", "garan diçe, golikan berdin", ew rabû û çû nav malê,
dît ku cêrê avê ser milê xwîşka wî Xezal e û temamê maliyên
malê berhevbûne û bi kişmiş çay vedixwin. Kek Mamend
pêşiya tevan das, hesan û cêrê ava xwe hilgirt û çû dirûnê û
zarokên malê jî her yek ji wan ber bi milekî ve belav kir. Dayîka
Pîrût xaltiya Mencê ku tenê li mal mabû, berê xwe da
5*
Pîrût:
- Kurê min, tu ji bo çi naçî dirûnê? Babê te çil salî ji te
mezintir e, ew berî te diçe. Tu qet şerm û 'eyb nakî?
Pîrût bi zanetî dixwest wê rojê li mal bimîne û bizane ka
gelo hewadîsên rêbirî û kuştina zabitan dê di gund de çawan
belav bibe. Pîrût xwe bêdeng kir û ji dayîka xwe re got:
- Dayê can, serê min diêşe, ez dixwazim îro li mal bimînim...
Pîrût ev got û xwe li ser kulavê malê yê kevin dirêj kir.
Wextê taştê, Xezal bi cêrê ava xwe ve ji ser kaniyê vegeriya,
bi nefesçikyayî û hêdîka ve berê xwe da kekê xwe û got:
- Keko, tu dizanî çi qewimiye. Min li ser kaniyê cêrên xwe
tejî dikirin, min dît ku riya aliyê Seqizê ve cotek ga bi otomobîlekê
ve girêdane û ber bi mala axê ve dikêşin. Axa, kurên
wî, muxtar û xulam hemû pê ve diçûn. Pîrejinan digotin
ku ew otomobîl a fermanderê Seqizê ye ûbi şev siwarên kurdan
riya wî birîne û ew şelandine û pişt re jî kuştine.
Pîrût bi sehkirina van gotinên ji xwîşka xwe berken bû û

xwe li nezanînê danî.
Êvarê kek Mamend ji dirûnê vegeriya, çawan das û hesana
xwe danî ser refkê, berê xwe da Pîrût:
- Erê te sehkiriye, dibêjin şevê mirovên Komeleyê riya fêrmander
girtine û kuştine. Qerenî Axa gelek qehiriye. Dixwaze
bi axayên din re, çawan dibe bila bibe rêbiran bibîne...
Kek Mamend meşrefêyê tejî av kir û vexwar, cardin dest
pê kir û got:
- Destê wan xweş be, bi Xwedê karekî baş kirine. Wî fermanderê
gor bi gor, 'ezaba san bi kurdan dida kêşan, destê
wan derd nebîne...
Pîrût, dema ku dît dilê babê wî bi vî karî gelek xweş e, di
dilê xwe de gelek kêfa wî hat û hê zêdetir bi karê kirî razî bû,
53
lê heta wê rojê navê Komeleyê sehnekiribû û ne jî dikarî seh
bike, çunkê dagîrkerên welat zimanê wî yê şêrîn ê bab û kalan
qedexe kiribûn û qet firset nedabûn ku pêş de biçe û bi
bêjeyên xwerî kurdî yên ji xezîneya bêbinî xwe dewlementir
bike. Pîrût û xortên wek wî, her çendîn xwendewar nebûn,
lê li gel vê jî di temenê xortîniya xwe de heta dihat zêdetir
bêjeyên farisî seh dikirin. Vêca ji ber vê, ew gotina nû gelek
lê ecêb dihat û bêyî ku bizane ew navê mirovekî ye, navê
îdareyê yan navê eşîretekê ye, wê gotinê di dilê wî de cîgirt û
li hember wê di dilê xwe de hurmet, evînî û rêz hîs dikir.
Çunkê tenê dizanî ku Komele jî dijminê wî reîsê xwînxwer
e.
Pîrût, ji bo Komeleyê fehm bike pirsî:
- Erê babo, Komele çi ye û li ku ye?

- Welle kurê min, ez bi xwe jî ewqas serî lê dernaxim, lê qasê tê gotin, ew Komele li Seblaxê ye, nehênî ye û dijminê axan û eceman e û tê gotin ku, dibêje gereke kurd bên azad kirin...

Kek Mamend di derheqê Komeleyê de ji wê zêde tiştekî din nedizanî ku kurê xwe têbigihîne. Lê her ew çend karekterên ku kek Mamend bi Komeleyê ve danî, di nav dilê wî bab û kurê kurmancê fêqîr de ji bo rojên xweş û rizgariya ji destê zulm û zoriya axatiyê ronahiyek peyda kir...

Pîrût êvarê çû nav zeviyê, ji nav gidîşa genim tiving derxist û ew bi perçe çatekî paqij kirin. Pîrût heta dereng li tivingan nêrî, lê ji nêrîna wan têr nedibû û di qondaxên wan ên biriqandî de serê Mîne Axa didît. Pişt re çarka xwe li herdu tivingan pêça û cardin ew di nav gidîşa genimê de veşartin û ber bi mal ve vegeriya. Ji tirsa babê xwe newêrîbû ew daxwazên ku di dilê wî de hene bêje û tenê çaveriya tiştekî bû ku

54

bibe firset û ew gotinên di dilê wî de hene ji babê xwe re veke. Piştî serpêhatiya şelandina makîna reîsê serkantê dewletê yê Seqizê û kuştina Xwocendî, Pîrût bi temamî guherîbû û te digot ew Pîrûtê berê nîn e ku biçe zibareyê, coyan paqij bike, baxan bikole û berî hemû paleyan qebaleya xwe temam bike. Êdî fikra tiştên wiha li ba wî tunebûn û nedixwest biçe ji axa re karkerî bike, hetta dixwest rojekê zûtir ji Kanîsewzeyê derkeve, gulle bavîje, serbest bibe, li gor dilê xwe bijî û serî ji kesekî re netewîne. Êdî ew ji wan kesan nebû ku guhê xwe bide muxtarê axa û ji hemû kesî zûtir ji bo ulamê derkeve pêş. Wek pêşiyan gotine: "Kor ji Xwedê çi dixwaze? du

çavên ronî". Hemû daxwaz û hêviyên Pîrût jî ew bûn ku tivingek bikeve destan û niha jî ew daxwaza wî bicî bûbû.
Wek ku dibêjin: "Keçel dizane dermanê keçeliya wî çiye", vêca kurd be tiving destan ketibe! Wey halê dijminê wî kurdî!
Kek Mamend têgihiştibû ku, Pîrût gelekî sist e û ji nîvê dilê xwe nerehet e û ji xwe aciz e. Kek Mamend bi derdê dilê kurê xwe hesiyabû û dizanî ku, Pîrût ji kerba Mirût dîn bûye û piştî Mirût xwe kuştiye heta niha ew bi temamî guheriye û gêj û lal bûye. Ji ber vê, ji bo ku dilê kurê xwe xweş bike, şevê dema ku li ser sekoya hewşa malê rûniştibûn, berê xwe da kurê xwe û got:
- Erê kurê min, ji bo çi tu rojekê naçî ba Şêrko. Tu dizanî ku ew reben tenê maye û ji te jî gelek hez dike. Ya baş ew e ku tu car caran serekî lê bidî.
Kek Mamend ev got û qelûna xwe vêxist û cardin:
- Ji Şêrko re bêje bila bêhna xwe teng neke, Xezal a wî ye û çi çaxê bixwaze dikare bê bibe...
Dema ku xaltiya Mencê ev seh kir, ji ciyê xwe hilpekî û
55
gotinên kek Mamend birî û got:
- Erê ma tu malxoyê wî mirovî yî. Tu qet melheze nakî dê tu çawan jinê ji vî kurî re bînî...
Kek Mamend ji jina xwe hêrs bû û got:
- Jinik, eqlê te nagihîje vê û tu nizanî. Şêrko hatiye mala min û me bi hev re nan û av xwariye û min soz daye wî. Gotina kurdan carek e ew nabe ducar. Mêr dibê mêr be û li ser sozê xwe bisekine. Tu dixwazî min bi vê kalbûniyê ve şermezar bikî û ez bibim pêkenê li ha û li wê? Ne, ne, tu nefehmî

û eqlê te sivik e, ez kurê babê xwe me û ez haşa pîç nînim.
Axir tu dizanî ew jî piştî xwîşka xwe ji berdêlî mehrûm bûye.
Tiştekî din jî heye ku dilê wî pê keça me ve ye...
Xaltiya Mencî dixwest cardin xeber bide û fikra xwe bêje,
lê ku dît mêrê wê gelekî hêrs bûye, tûka xwe dabeland û lêvên
xwe ji ser hev ranekirin. Pîrût jî di dilê xwe de gelek kêfa
wî ji gotinên babê wî re hatibûn, lê li gor orf û adetên kurdîniyê
heqê wî tunebû xwe têke nav gotinên dê û babê xwe û
xwe bêdeng kiribû. Pîrût di dilê xwe de bêriya Mirûta ciwana
evîna dilê xwe dikir û digot: "Emê Xezalê bidin birayê te
û bila gulek ji gulistana nav dilê min ku min ji bo te perwerde
kiriye, bibe nimûneyek ji eşq û evîniya min ji te re, ey gula
sîsbûyî ya Kurdistanê, bila ji bo birayê te yê tekane ruhê te
yê pak û saf rehet be...".
Hê bayê hêrsbûna kek Mamend ji ser ranebûbû, ji nişka
ve kir qêrîn:
- Xezal, Xezal, ka were vir ez bizanim.
Xezal ku li hindur rûniştibû û li ber çirayê bifitîl derpê û
kewayê babê xwe pîne dikir, bi sehkirina dengê babê xwe da
xwe rabû û ber bi hewşê ve çû û got:
- Kerem bike babo, tu çi dixwazî?
56
- Erê keça min, tu dixwazî Şêrko bikî?
Xezal ku ji babê xwe ne li hêviya pirseke wiha bû, bi sehkirina
wê te digot cêrek ava sar serî de kirine û wek kaçkaçokê
sor bû, serê xwe kir ber xwe û te digot nefesê jî nastîne.
Kek Mamend:
- Dê bêje, tu dixwazî bi wî re bizewicî an na?

Cardin pêjn ji Xezalê derneket.
Kek Mamend bihêrs:
- Keçê tu kerr î, zimanê te jêkirine, te elemê girtiye, ji bo çi tu bersîva min nadî?
Xaltiya Mencê, ku gelek baş xasyetê mêrê xwe dizanî û dizanî ku eger gelek kerba wî vebe dikare li keçkê jî bixe, ji hêdîkave çû ber guhê wê û bi dengekî nizm jê re got:
- Keça min bersîva wî bide, bila neqehire...
Kek Mamend cardin...
- Dê tu çi dibêjî. Yan ji kesekî din hez dikî û te kiriye serê xwe tu pê re birevî, tu dixwazî heyayê me bibî û rûyê me reş bikî...
Xezal bi sehkirina van gotinên babê xwe te digot xencerek ser dilê wê dane û gelegirînî bû. Kek Mamend hinekî din jî daser:
- Dê bireve, bireve.
- Babo, qet rev li keçên te tê ku tu van gotinan layîqê me dibînî û dibêjî?
Kek Mamend gotina keça xwe birî û got:
- Gelek nerês e, bêje ez bizanim, tu dixwazî ez bi vê kalbûniya xwe derewîn derkevim?
Bi vê gotinê hinekî din jî dilê Xezalê tejî bû û bi dengekî nizm û li gor orf û adetên kurdînî got:
- Ez di bin emrê kekê xwe de me, ew çawan baş bizane ez
57
ê wisan bikim. Xezal ev gotin û ber bi malê ve vegeriya.
Êdî şev dereng bûbû. Pîrût, Xezal û kek Mamend, her yek ji wan bi awakî dilxweş bûn. Pîrût dilxweş bû ku, dê biçe

Kanîkîsele û ji Mîne Axa tola xwe veke û mizgîniyê jî bigihîne Şêrko. Xezal dilxweş bû ku, babê wê razî ye û dê wê bide Şêrko. Kek Mamend jî dilxweş bû ku, sozê xwe bicî tîne, derewîn dernakeve û dilê kurê kurmancekî xweş dike.
Her xew nediket çavê xaltiya Mencê tenê, nerehet bû û ketibû nav deryaya wan fikir û xeyalan de ku nedizanî dê bi kîjan riyê Pîrût bizewicîne...
Pîrût eynî şevê ji mal derket û çû tiving û fişek ji nav gidîşa genim derxist û bi riyek rêder re ber bi Kanîkîsele ve ket rê. Dema ku bi ser Zênoya li hemberê malan ket şefeqa sibê jî avêtibû û bayê sehera sibê dengên musîqayê yên ji Kanîkîsele dihatin digihand guhê mirov. Eger kesên bi kul û derd guhê xwe bidana vê musîqayê, bê şik wan dikarîn hemû derd û kulên xwe bi van ahengên musîqayê jibîr bikirina û bêyî hay lê bin dest bi govend û şahîniyê bikirina.
Çi musîqe, çi musîqe! Dengê kilîna meşkan, çêlekdotina keçan, bangên dîkên berê beyanê, hîre-hîra hespan, kare-kara karik û berxan, waqe-waqa qaz û werdekên gola ber malan, hawara şivan, gavan, golikvanan û bi sedan dengên din têkelê nav hev bûbûn û ahenga musîqayek wisan saz bûbû ku ji destê tu nivîskarên musîqayê yên bi nav û deng yên dinyayê nivîsandina musîqayek wiha nedihat... Lê ji wê ahenga xweş û dilbikul dengekî din jî dihat ku heta Xwedê hez bike nexweş û dilêş bû. Bi dengê qaz, quling, kew, qîqî,
58
teyrê şivanan, reşîle, mirîşkên avê, kotir, pepûk, kûresol û bi sedan teyrên din yên xweşik ku şahîniya biharê girtibûn, dengê kundan li ser kulavê zivistanê bi tundî rûniştibû û bi

dengê xwe yê nexweş bersîva wan dida û digot: "dê rojek bihara we jî kavil be û dê zivistan bi ser de bê, xwe ewqas mezin nekin", dihat. Bi van gotinan tevan bêdeng dikir û xem û kul bi ser wan de diwerand. Ew dengê ku ahenga musîqaya tabîî Kanîkîseleyê xera kiribû û wek dengê kundê ji nav hemû wê ahengê dihat û diket guhê mirov, dengê muxtarê mala axê bû ku, wê beyana zû ketibû nav kolanan û xelkê bangê ulamê dikir. Lê Pîrût guhê xwe neda wî dengî.
Ji Pîrût re Kanîkîsele ji hemû ciyê dinyayê xweştir bû. Çunkê cara yekê li ser kaniya vî gundê bi me'neya hezkirinê ya rasteqînî gihîştibû û hemû hêvî û daxwazên xwe yên dahatû bi jinanîna keça vî gundê xweş kiribû. Pîrût ji ber xatirê gula ciwana ruhê xwe hez ji dar û berên Kanîkîseleyê jî dikir. Dema ku ew ser Zêno ket û Kanîkîsele pêş ve hat xuyakirin, hemû ew keç û jinên meşk dikilan, tepik çêdikirin, gulkan berdidan, av dianîn, tendûr vêdixistin û taştê dibirin dihatin ber çavê wî û di dilê xwe de digot: "ev hemû nas û destxwîşkên Mirûta min a şêrîn in û bêhna Mirût ji wan tê..."
Mala Şêrko li rexê gund bû û diket ser riya Pîrût. Pîrût, ji bo ku kesek wî nebîne bi riyeke nepenî re xwe avêt hewşa mala Şêrko. Şêrko taze ji xew hişyar bûbû. Dîtina Pîrût bi du tiving û gelek fişekan ve ew hinekî şaş kir, lê zû hişê wî hat serî û Pîrût bir jorê, berî hemû tiştî û heta berî ku pirsa hal û kêfa Pîrût bike, bi herdu destan tivingek hilda û maçî kir û danî ser serê xwe. Te digot sofî Heme Hesenê meşhûr ê Şarwêranê ye cêrek ava destnimêjê ya qirêj a dest û lingên şêxê xwe bi dest xistiye û li çavê xwe yê kor ê tekane dixe ku
59

ji bînahiya çavan nebe. Yan jî te digot Mam Hacî ji Mekke û Medîneyê lalûpêçek gilî aniye mal û têkelê nav ar, genim, şekir û çaya malê kiriye ku bereket bikevê...

Şêrko, tiving û fişek di kewarê de veşart û milê Pîrût girt û çûn serê jorê odê rûniştin. Pîrût gelek dilteng û bi mereq bû û ji hesreta Mirût çavên wî tejî hêsir bûbûn, lê ji şerman li xwe nedidanî û bêyî ku bikare temaşa nav çavên Şêrko bike serê xwe kir ber xwe û rûnişt. Navek re herdu jî bêdeng bûn û çunkê derdên hevûdu fehm dikirin. Şêrko, ji bo ku xwediyê xanî bû xêrhatinê li Pîrût da û hal û kêfa Kek Mamend û xaltiya Menîcê jê pirsî, lê ji şerman behsa Xezalê nekir. Lê Pîrût ji bo ku dilê Şêrkoyê destebirayê xwe xweş bike, got:

- Babê min got ku, Xezal jê re pîroz be, Xezal jî min kiriye wekîlê xwe. Ji xwe tu jî dizanî ez ji bo tolevekirinê tu texsîratî nakim û xwîşka min jî li te pîroz be...

Şêrko bi sehkirina wan gotinên dawiyê yên Pîrût, li gor orf û adetan rabû û destê wî maçî kir û Pîrût jî ji xwe li bahaneyekê digeriya ku dilê xwe pê hênik bike, ji ber vê destê xwe avêt sitoyê Şêrko û dest bi girînê kir. Piştî bi ser xwe ve hat, Pîrût got:

- Kekê min, tê bîra te ku me sond xwar em tola Mirût vekim, vêca va ez hatime ka gelo fikra te çiye?

Şêrko ji Pîrût zekîtir, hîşyartir û têgihîştîtir bû û Pîrût jî bi vê yekê dizanîbû û ji ber vê jî ew pirs ji wî kir. Şêrko got:

- Kekê min, ez bi xwe ji mêj ve ye di wê fikrê de me û bi dîtin û hatina te di halekî wiha de, tê dîtin ku firsetek baş ji bo daxwaza me pêk hatiye.

Di nav gundiyên Kurdistanê de adetek heye, dema ku qîma

xwe bi zulm, zordarî û ulama ji heddê der ya xwediyê
milk neynin, bi riyên cihê cihê zerarê didinê. Agir berdidin
60
lodên genimên wan, dovê hespên wan yên herî di dilê wan
de ezîz e dibirin, pez û dewaran berdidin nav genim, bostan
û tutinên wan, yan jî ava hê dema wê nehatî berdidin ser zeviyan,
ew dibetilînîn û darên wan dibirin û. hwd...
Vêca ew herdu xortên dilşewitî rûniştibûn û difikirîn ku
pêşî Mîne Axa bibetilînin û zerarekê bidinê. Şêrko ku li
gund baş xuya bû, kele, nav xaniyan û derûdora mala axê
baş dizanî, bi vî awayî fikra xwe got:
- Di van dawiyan de Mîne Axa ketiye nav xof û tirsek mezin
û ji bo parêzgeriya xwe gelek tiving sitandine. Axayê Kanîgorgê
dijminê serê Mîne Axa ye û niha çek û cebirxane ketiye
destan û êrîşê Mîne Axa dike. Vêca ji ber vê, xew nakeve
çavê mîne Axa, heta şefeqa sibê ji bo kontrola riya Kanîgorgê
li rexê baxê xwe mirovên xwe dide rûniştandin û ew tembîh
kirine ku bi dengê tivingan re bêsekin wî agahdar bikin. Mîne
Axa xulamên xwe yên din jî tembîh kirine ku bi teqîna tivingan
ji aliyê baxê ve ber bi wê ve biçin û nehêlin dijmin
bikeve nav gund. Hetta li hemû paleyên ku ket û giya didûrîn
jî tembîh kiriye ku bi teqîna tivingan nesekinin û bêsekin
biçin hewara xulamên din. Vêca dê tu sibê piştî şîvê û belavbûna
xelkê ji mizgeftê, tivinga xwe hilgirî û ber bi aliyê baxê
ve biçî. Du sed gavan ji baxê wêdetir pirek heye, dê tu tam li
hemberî wê pirê tivingekê biteqînî û ber bi milê rojavayê ve
vegerî û bê mal û ji xwe re rakevî...".
Pîrût, berî ku bihêle Şêrko gotinên xwe temam bike jê re

got:
- Kekê min, min sond xwariye dibê ez gulleya tivinga xwe ya yekê berdim dilê mîne Axa. Ya ku tu dibêjî ne li gor min e.
Şêrko jê re got:
61
- Serhişkiyê neke û ez çi dibêjim gotina min bike. Min planek baş çêkiriye û xera neke.
- Ne kekê min, tu çi bêjî ez ê gotina te bikim, lê ez gulleya yekê bi tivinga xwe bernadim.
Şêrko, dît ku feyde nake, rabû û çû herdu tiving bi temamê fişekan ve ji kewarê derxist û anî û raxist ser berkê û pirsî:
- Ev herdu tiving ên kê ne?
- Yek a te ye û ya din jî ya min e.
- Kîjan a te ye?
- Tu kîjanê dixwazî ji xwe re hilgire.
Şêrko tivingek bi sed fişekan ve veqetand û kir nav kovarê û jê re got:
- Ji bo ku sond bi te nekeve, sibê tivinga min bi xwe re bibe.
Pîrût, ku heta wê çaxê bi mebesta Şêrko negihîştibû dest bi ken kir û got:
- Bi Xwedê tu fêlan dizanî. Dê ka ji min re bêje piştî ku min gulleyek teqand dê tu çi bikî?
Sêrko got:
- Min ji te re got were malê û rakeve. Êdî karê te bi tiştekî din neketiye. Dê tu pişt re bibînî.
Pîrût wê rojê qet ji mala Şêrko derneket derve û bêsebir li hêviya êvarê ma. Dema ku tarî bû micewr derket serbanê

mizgeftê û bang da. Pîrût qasê seetekê xwe li hewşa mala Şêrko bêdeng kir. Dema dît ku xelk ji mizgeftê derdikevin, rext û tivinga Şêrko hilgirt û bi pênc fişekan dagirt û ber bi aliyê pirê ve ket rê. Şêrko jê re çawan gotibû bi wî awayî kir û ji aliyê rojavayê ve ber bi mal ve vegeriya. Dema ku gihîşt pişta hewşa xanî dengê qêr û hawarê gihîşt guhê wî. Dixuya

61

ku temamê xulamên axê êrîşê ber bi aliyê baxê ve dikirin. Pîrût nêzîkî nav çepera mal bû û dikir ku bikeve hindur û biçe jorê, dît ku ew şeva tarî û zilmat bû wek rojê. Loda ketê mala Mîne Axa ku serê wê gihîştibû asîmanan agirek wisan pê ketibû ku ji pişt çiyan jî pêta agirê wê dihat dîtin. Sorahiyê asîmanan girtibû, Pîrût di wî halî de plana Şêrko fehm kiribû û berkenek hatê û di dilê xwe de got: "Welleh tu mirovekî wisan î ku tu dikarî kumê Şeytên berevajî bidî serî..."

Pîrût çû hindur hinekî rûnişt, lê dît ku Şêrko nehat. Sitare lê nebû û derket derve û ji dûr ve li pêta êgir nêrî. Qasek din bi ser de çû cardin Şêrko nehat. Êdî sebra wî nema û nekarî xwe lê bigre. Pîrût tiving û rextê xwe veşart, xencera xwe kir ber pişta xwe û ber bi agir ve ket rê û gelekî mereqa Şêrko dikir û di dilê xwe de digot: "Xwedê neke eger ketibe destê axa, welleh dê wî bikuje." Pîrût xwe da pişt dîwarekî nêzîkî êgir veşart û dît ku temamê xelkê bi satilan, bi qovan, cêran û tenekan avê dikêşinin, ax û xweliyê diavêjin ser agirê û mijûlê tefandina agire lodê ne, hemû ev karên han ji dûr ve gelek baş dihatin kifşekirin. Ronahiya agirê lodê wek elektrîkê temamê derûdoran ronî kiribû û Pîrût gelek hêsanî dikarî însanan ji hev veqetîne. Dema ku Pîrût baş lê nêrî, dît ku va

ye merek di destê Şêrko de ye û ew jî ax û xweliyê diavêje
ser êgir. Çaxê Pîrût ev dît bawerî bi çavê xwe nekir, lê çiqas
diçû pêtên êgir geştir dibûn û ser û çavê Şêrko jî baştir dihat
dîtin. Pîrût xwe lênegirt û ji hêdîka ve çû ba Şêrko û bêyî li
Şêrko binêre wî jî dest bi tefandina êgir kir. Gelek bi ser de
derbaz nebû, Şêrko Pîrût dît û dema ku van herdu çavan hevûdu
dîtin, ev gotinên han jê hatin xwendin. Şêrko ji Pîrût
re digot: "axir min ji te re negot here mal û rakeve, tu ji bo çi
hatî vir. Ji bo mineta teqîna tivingê...", ji çavên Pîrût jî dihat
63
xwendin û digot: "bi Xwedê se û fêlbazekî wekî te di dara
dinyayê de tune..."
Pîrût çavên xwe li derûdora xwe gerand, dît ku deh û
panzdeh gav li pişt wî mirovek sekiniye, bi şedeya serî, miradxanê
reş, şalê zer, piştîniya peşmîne, xencera qevde spî û
çend pişkokên zêr pê ve, zanî ku ew axa ye û di vî haletê han
de dixwest dest bavêje xencera xwe û wî perçe perçe bike, lê
dema ku li Şêrko nêrî, ji çavên wî derxist ku ew razî nîne û
bi awakî nejidil cardin dest bi tefandina êgir kir.
Dema ku Şêrko bi mer, ax û xwelî bi agir de dikir, di dilê
xwe de difikirî ku her vê şeva han Mîne Axa wenda bike.
Her çendîn hatina Pîrût li ber agirê vî karê han zortir kiribû,
lê di milekî din de pê xweş bû û digot ku: "vêca her bila Pîrût
jî bê, wellehî emê îşev vî mizûrê han bifewtînin. Hekene
dê ew piştî vê şewata han zêdetir miqateyê xwe bibe. Niha
hemû xulamên wî bi tefandina agir ve mijûl in, serê wan di
xayîlê de ne û fikra wê yekê nakin ku axa ber bi mal ve bişînin.
Gereke ez tiştekî wisan bikim ku axa biçe mal û wê çaxê

ez jî dikarim biçim kolanek tarî û li ser riya wî li hêviya wî bimînim...".
Şêrko hem kar dikir û hem di serê xwe de plan digerandin. Dema ku dît hemû tişt di serê wî de bi rêkûpêk e, xwest Pîrût jî bi mebesta xwe agahdar bike. Şêrko, ji bo ku bikare xwe nêzîkî Pîrût bike û tiştên difikire jê re bêje, berê xwe da xulamê axê Bapîr, ku li hemberî wî bû û ew jî bi merê bi tefandina êgir ve mijûl bû, jê re got:
- Kek Bapîr, mala te neşewite, ji axê re bêje bila li ber ronahiya vî agirê han nesekine. Bila biçe mal. Kî çi dizane, belkî ew sebabê agir berdaye vê loda han li ciyek nepenî xwe veşartiye û dixwaze gulleyekê jî berde axê. Mîne Axa ha li vir
64
be û yan li vir nebe, ji xwe xelkê gund hemû li vir e û agir ditefînin...
Bapîr çawan vê sehkir, gelek munasib dît û mera destê xwe de girt avêt û çû ba axê. Dema ku Pîrût dît mer vala ye bêsekin çû girt anî û hat mil bi milê Şêrko dest bi xebatê kir. Şêrko vê navê re temamê plana xwe jê re got. Dema ku Pîrût ev gotin ji wî seh kirin, got:
- Ka ez biçim tivingê bînim.
Şêrko bihêrs jê re got:
- Lez neke, tu jî pê min de were.
Di vê navê re Şêrko dît ku, Bapîr xwe nêzîkî guhê axê kir û tiştek jê re got, ew jî bi lez ji ber êgir bi dûr ket û ber bi aliyê malê ve meşiya. Dema ku Bapîr vegeriya ber êgir, Şêrko jê re got:
- Kek Bapîr, ha mera min ji te re, ez ê biçim ser avekê û bêm.

Xaniyê Mîne Axa li milê din ê gund bû û ji ciyê şewatê ve nedihat dîtin. Deriyê wî yê ser kolanê li pêşberê dehlekê bû û deh-panzdeh gav ji wê wêdetir jî rêkorek sernişov ber bi aliyê dehlê ve diçû. Mîne Axa li milê rastê dimeşiya, ji bo ku Şêrko bikare bikeve pêşiya wî û kesek wî nebîne, li milê çepê meşiya û ji Mîne Axa gelek zûtir gihîşt nav wê riya sergirtî ya tarî. Pîştî Şêrko çû, Pîrût jî bi bahaneya bihênvedanê mera di destê xwe de danî erdê û di pişt wan de meşiya.
Şêrko taze gihîştibû nav wê riya sergirtî, dît ku kuxte-kuxta Mîne Axa ye û nêzîkî wî dibe. Di demên wiha de kuxte-kuxta Mîne Axa ji tirsan bû, te digot ji êrîşa ku lê bihatiya kirin re dibêje: "va ez têm, xwe ji ser riya min bidin alîkî...".
Mîne Axa hê gava xwe neavêtibû riya sergirtî, Şêrko derket pêşî. Mîne Axa bi dîtina Şêrko di vê şeva han a tarî de hinekî
65
veceniqî û bêyî li xwe deyne, xwe hêrs kir û got:
- Hêtîmo, tu li vir çi dikî, xelk hemû mijûlê lodtefandinê ye, here, here alîkariya wan bike!...
Şêrko bersîva axê da û got:
- Qurban, ez ji bo xizmeta jina axê çûbûm...
Dema ku Mîne Axa ev gotin seh kirin, destê xwe bire xencera xwe û ji kalanê wê derxist û dikir ku li Şêrko bide, tam wê navê re ji pişt ve Pîrût bi destê Mîne Axa girt û bada û xencer ji destan ket erdê. Pîrût xwest ku wî bi xenceran kerî-kerî bike, lê Şêrko bi destê wî girt û got:
- Melezîne, mala te bişewite. Ka zû piştîniya wî ji pişta wî veke û deyne ser pişta xwe û em biçin.
Pîrût bi lez piştîniya Mîne Axa ji piştan vekir û da destê

Şêrko û Mîne Axa da pişta xwe û Şêrko Mîne Axa qahîm li pişta Pîrût girê da û ji bo ku deng jê dernekeve destmala ber xencerê jî li devê wî girê da û ketin rê. Ew ber bi aliyê dehlê ve ber bi jêr bûn. Nêzîkî sê çarîkan çûn û heta gihîştîn wî ciyê ku Şêrko cenazeyê xwîşka xwe dîtibû. Dema ku gihîştin wir, Şêrko, Mîne Axa ji pişta Pîrût danî erdê û destmala ser devê wî vekir û got:

- Dê, merezbab bêje, te çima Mirût kuşt û te ew li binê kîjan darê kuşt?

Ji tirsan zimanê Mîna Axa nedileqî û lêvên wî ji ser hev ranedibûn, bersîv neda. Pîrût bi şeqam û pehînan ket ser û qasekê şûn de bi naçarî xire-xirek jê hat û bi destê xwe darek nîşan da.

Şêrko bêsekin serek piştîniyê bi wê darê ve girê da û ji Pîrût re got:

- Here kevirekî bîne û deyne bin piyên vî seyî.

Pîrût wek pehlewanan kevirekî mezin himbêz kir û anî da-

66

nî ber darê û ji Mîne Axa re got ku derkeve ser wî kevirî.

Şêrko vê carê jî serê piştîniyê yê din li gewriya Mîne Axa aland û berê xwe da Pîrût û jê re got:

- Lo, tê bîra te ku min ji te re got: "keko, dinyayê dûr e, dê roja me jî bê". Belê niha ev heramzadeyê han ê bênamûs û diwênpîs, ku bû sebebê xwekuştina xwîşka min û destgirtiya te ya delal ber destê me ye û di bin darê tolevekirinê de ye. Ev rûresê han ne tenê qatilê xwîşka min e, belko wî babê min jî ji birçiyan kuşt, çend caran muamelên sivikatî û heqaret jî bi min re kiriye. Ji ber vê tu îzna min bide ez ê bi vî dilê

xwe yê tejî, kevirê bin piyên wî bikêşim.
Şêrko ev got û kevir kêşa û kelaxê Mîne Axa daliqandî di hewa de ma û herdu çavên wî zîq derketin derve. Pîrût jî ji bo ku têhna dilê xwe bişkîne çend xencer li laşê wî yê mirî xist...
Şêrko û Pîrût bi kêf û xweşî vegeriyan mal û dîtin ku hê agir ji loda axê bilind dibe û xelk jî bi tefandina wê ve mijûl e. Şêrko berê xwe da Pîrût û jê re got:
- Êdî derengîketina me ya mayîna li van deran bêfeyde ye û divê em îşev biçin. Rabe em ê tivingên xwe hilgirin û biçin Kanîsewzeyê ba kek Mamend. Emê sibê li wir bin û êvarê jî bikevin rê ka em bizanin Xwedê dê riya me ber bi ku ve bibe...
Herdukan rextên xwe girêdan, tivingên xwe hilgirtin û derketin. Pîrût berê xwe da Şêrko û got:
- Tu Xwedê bikî ka em di nav dehlê re biçin û em çarekê din ji kelaxê wî sebabî re bibînin.
Şêrko, ji bo xatirê Pîrût berê xwe da ser riya nav dehlê û gelek ser de neçû gihîştin ciyê ku kelaxê mîne Axa li wir bû. Pîrût, lûla tivinga xwe ya bimo ya kurt kir ser singê Mîne
67
Axa û tiliya xwe kêşa û pişt re lê nêrî û ji nîvê kezeba xwe nefesek sitand û got:
- Oxxx, min sonda xwe bi cî anî û ez derewîn derneketim...
Micewrê mizgeftê ji bo banga sibê taze derketibû serbanê mizgeftê, Şêrko û Pîrût nêzîkî Kanîsewzeyê bûn û tiving û rextên xwe di nav zeviyê de veşartin, berê xwe dan mala kek Mamend. Kek Mamend jî nû ji xew rabibû û mijûlê destnimêjgirtinê bû ku, dît Şêrko û Pîrût ketin hindur. Çavên Şêrko

çawan bi kek Mamend ketin çû destê wî maçî kir. Ev dihat wê me'neyê ku "ez gelek kêfxweş im ku te min ji bo xulametiya xwe qebûl kiriye...". Kek Mamend û xaltiya Menîc wek mêvanekî herî 'ezîz pêşwazî li Şêrko kirin û Xezalê jî li milê din ji bo haziriya xwirîniyê dihat û diçû. Piştî xwirîniyê û vexwarina çayê, kek Mamend dikir ku das û hesana xwe bigre û biçe dûrîniyê. Lê Pîrût çû ber guhê wî û jê re got ku karekî Şêrko bi te heye û tu bikarî hinekî din jî bisekinî baş dibe. Kek Mamend zanî ku dê Şêrko di derheqê Xezalê de pê re biaxive, ji ber vê îşaretek da xaltiya Menîc ku ew û Xezal derkevin ji derve û ew jî bi bahaneya avanînê derketin...

Dema ku hersê tenê man, Şêrko serê gotinê daxist û got:

- Kek Mamend, tu ciyê babê min de yî û ez dizanim ku tu qasê Pîrût ji min hez dikî. Min û Pîrût me karek kiriye û em dixwazin ji te re bêjin û bi te bişêwirin...

Şêrko ev got û pişt re mesela agirberdana lodan û kuştina Mîne Axa tevan jê re neqil kir. Kek Mamend jî ji nîvê dilê xwe ve guhê xwe da wî û pişt re jê pirsî:

- Êê baş e, we tiving ji ku bi dest xistin?

Pîrût dizanîbû ku babê wî bi bûyera şelandin û kuştina serokê fermanderiya Seqizê dilxweş e, bêtirs hemû meselê jê re

68

got. Dema ku kek Mamend ev seh kirin, di dilê xwe de bi kar û mêraniya kurê xwe serbilind bû, lê li xwe danenî û me'da xwe tirş kir û got:

- Hêtîmê çilmîn, te ji bo çi bêpirsa min ew kar kir, ji kengê ve ye ku tu bêpirsa min karan dikî?

Ji uslûba xeberdana wî dihat zanîn ku ew van gotinan ji dil

nake, ji ber vê dilê Pîrût û Şêrko ewqas pê neşikestin. Pişt re kek Mamend qelûnek dagirt û mijek Iê da û ji nû ve dest bi xeberdana xwe kir û got:
- Kuro lo, çi dibe bila bibe, destê we xweş be. Ji xwe wan reîs û axayan heşra me anîbûn û me ji destê wan îdare nedikir. Em di bin destê wan de mirin. Ji xelkê jî wisan e ku mirovên Komeleyê hatine riya wan birîne û ew sekitandine, ew nizanin ku Pîrûtê me yê 'ecemî bûye mêr û bi xencer ketiye ser dîlê wan reîs û meyîsan. Mezinan meseleyek meşhûr gotine: "Cehşên bi pirç, gulikên bi zik û zarokên lixêz esîl in", bi Xwedê Pîrûtê me yê bipirç jî ji wan e.
Dema ku kek Mamend ev got, Şêrko û Pîrût dest bi ken kirin û ew bi xwe jî keniya û ji kenê wî jî dihat dîtin ku kek Mamend bi kurê xwe serbilind e. Navekê re hersê jî bêdeng bûn û pişt re Şêrko hilda û got:
- Tu rastiyê bixwazî kek Mamend, êdî di vê rewş û halê han de em nikarin li vir bisekinin, dibê em berê xwe bidin rê û biçin welatekî din. Her çendîn ji bo rêbirî û kuştina fermanderê eskerî kesek şikê ji Pîrût nake, lê herkes dizane ku şewitandina lodan û kuştina Mîne Axa karê me ye.Temamê xelkê Kanîkîsele dizanin ku qatilê xwîşka min Mîne Axa ye û min kîna wî di dilê xwe de veşartiye. Vêca em niha hatine ji te dipirsin û em dixwazin serê xwe hildin û biçin, bizanin ka dê Xwedê me rastê çi bîne.
69
Pîrût jî, ji bo ku ew gotinên di dilê wî de ne ji babê xwe re birêje, wî jî piştî Şêrko hilda û got:
- Bi Xwedê babo, êdî tu min bikujî jî ez ji mala Qerenî

Axa re ulam nakim û êdî ez naxwazim dujînên axa, muxtar
û gizîr seh bikim. Niha êdî tivinga min heye û ez Şah jî ji
xwe re bi xulamtî qebûl nakim. Ez dixwazim serbest bijîm û
li hemberî tu kesî serî netewînim.
Kek Mamend bi bihîstina van gotinan ji devê kurê xwe,
çavê wî tejî rûndik bûn û got:
- Ax ez çi bikim, jin û zarok ser pişta min in, hekene welleh
dê ez jî bi we re biketima rê û wê çaxê dê we bidîta dê
min çi heşrek bi serê van axa, reîs û meyîsan de bianiya.
Dema ku Pîrût ev gotinên babê xwe seh kirin, kelegirînek
hatê û got:
- Babo êdî tu kal bûyî, li mala xwe rûne û wan karan ji me
re bihêle. Niha dewr dewra me ye.
Dema ku kek Mamend ev gotin seh kirin, hinekî berken
bû û got:
- Kurê min, "dema hirç dikeve kurJcên wî bi gunikên wî
dileyzin", li gor te jî ez niha kal bûme û tiştek ji min nayê.
Welleh niha jî di nîşan, cirît û pişthespiya xwe de ez sed kesên
wek te ji cêba xwe derdixim. Te seh kiriye ku dibêjin:
"hêstir bimre jî postê wî barê sed keran e...".
Pîrût serê xwe kir ber xwe û Şêrko jî bi kek Mamend re
dest bi ken kir. Pişt re kek Mamend hilda û got:
- Xwedê alîkarê we be, herin, lê min jibîr nekin û car caran
serî li min bidin...
70
Şêrko û Pîrût bi şev bêyî ku bizanin dê bi ku ve biçin û armanca
wan çiye, ji Kanîsewzeyê derketin.
Pîrût, piştî kustina fêrmanderê eskerî û Mîne Axa êdî bîr û

baweriyên wî yên di derheqê dinyayê de bi temamî hatibûn guhertin, tenê melheza şer, rêbirî, mêrkujî û tiving di mejiyê wî de hebû û ji van pê ve qet fikra tiştekî din nedikir. Hemû hewlên di mejiyê Pîrût ew bûn ku, bi serbestî bijî û bindestiya tu kesî neke. Lê nedizanî jiyana riyek wiha çawane, tenê di hişê wî de tiving hebû. Herçî Şêrko bû, bi awakî din li dinyayê dinêriya û ew wek Pîrût di fikra şer, rêbirî û kuştîniyê de nebû. Şêrko jî dixwest bi serbestî û bi azadî bijî, lê ne bi xwe bi tivinga xwe ve li çiya û baniyan...

Herdu bi hev re dimeşiyan, lê her yek ji wan bi awakî din difikirîn, wek dibêjin: "dil agahê dil e", ew jî ji dilê hevûdu agahdar bûn. Ji nişkave Şêrko dest bi xeberdanê kir û got:

- Pîrût, were em îşev xwe bigihînin Berderesê û bibin mêvanê Mîrza Qutas. Mîrza Qutas mirovekî dinyadîtî ye û destebirayê babê min e jî. Mirovekî gelek têgihiştiye û emê lê bişêwirin û bizanin ka dê ji me re çi bêje.

Pîrût razî bû û herdu ber bi Berdereşê ve ketin rê û nêzîkî paşîvan gihîştin qonaxa xwe û ji hewşa Mîrza Qutas derbazê jorê bûn. Dema ku çavê Mîrza Qutas bi van herdu xortên bitiving ket hinek silikî, lê silav û hurmetên Şêrko ew nerm kir û gelek bigermî xêrhatinî li wan da û ew birin li serê jorê odê dan rûniştandin.

Mîrza Qutas di salên xwe yên zaroktiyê de di hucreyên fêqîtiyê de wek şagirt hinekî li ba mela xwendibû û heta "Mirîşka Reş" hatibû. Dema ku roja ew gihîştibû sûreta "'Ebese wetewella, encaehû'l-'ema, wema yûdrîke le'elellahû yêzzekûma", ji Mîrza Qutas re gotibû: "Qutas, 'ebese yanê xwen-

7i

din bes e, wetewella yanê bûye mela, wema yûdrîke yanê gelek e, bê ji mela re mirîşka reş e...". Zirediya Qutas mirîşka reş nedabûyê ku ji mela re bibe û wî jî dev ji xwendinê berdabû. Lê bi wê qasê xwendina xwe jî dikarî lîsteya goşt û deynên dikandar binivîse. Vêca ji ber vê, hê di zaroktiya wî de xelkê gund navê Mîrza Qutas pê ve danîbûn. Ji bo pêşdebirina paşnavê xwe Şahnameyek Firdewsî ya çerimkirî destê xwe xistibû, beşa piraniya helbestên wê jiber kiribûn û bi şev xelkê gund li dora wî berhev dibûn û wî bi dengekî xweş ji wan re dixwend. Ew xelkê nexwenda yên li dora Mîrza Qutas berhev dibûn û tenê li devê wî dinihêrî û tiştek ji wan helbestan fehm nedikirin, digotin: "mirovekî ku bikare kitêbek evqas sitûr bixwîne, bêşik dibê ew melayekî dowanzdeh ilmî be...". Mîrza Qutas car caran bi siyasetê ve jî mijûl dibû. Di salên dawiyê yên Hukumeta Pehlewî de bûbû katibê axayê Berdereşê. Ji ber ku axa mirovekî nexwenda bû, dema ku karekî wî biketiya îdareya dewletê di ciyê xwe de Mîrza Qutas dişand.

Mîrza Qutas, ji destê memûrên dewletê û bi taybetî jî ji destê jendirme, polês û îdareya eskerî ewqas 'ezab, eziyet, zulm û zordestî dîtibû ku, qasê dinyayê kerba wî ji wan vedibû. Wî bi çavê serê xwe dîtibû ku karbidestên dewletê bi çi awayê sivikatî bi neteweyê wî, zimanê wî, orf û adetên di welatê wî de hene dikin. Eger ji destê wî bihatiya dê wî di cî de ew perçe perçe bikirina û yan bi qewlê wî ku bi xwe digot: dê bişandiya "cehennema mûşeret". Mîrza Qutas gelek ji neteweyê xwe hez dikir û dema ku Şahname dixwend bi kibrî û serbilindî ji xelkê re digot: "ew pehlewanên ku Firdewsî

behsa wan dike, hemû kurd bûne. Lê rûyê zemên reş be, niha dewran guheriye û mişk û koremişk siwar in û şêr û pi-
71
ling peyane. Di şûna bazan de qirik diqirin, di şûna qulingan de kund dixwînin...".
Dema Riza Xan de, her çendîn pêç û piştînî hatibûn qedexekirin û çi kesê wergirtiya jendirman lê dixist, eziyet lê dikirin û ceza dikirin, lê li gel vê jî Mîrza Qutas pêç û piştînî danenîbû. Tenê dema ku axa ew ji bo karekî dişand bajêr, li nêzîkî bajêr pêça xwe dikir paxila xwe û kulavekîqirêj û kevin yê "pehlewî" dida serê xwe. Dema ku dam û dezgehê Riza Xan têk çû, Mîrza Qutas berê hemû tiştî ew kum da ber pehînan û ew di huzura xelkê gund de şewitand.
Têkçûna Hukumeta Pehlewî, çekdariya kurdan, avabûna Komeleyê li Seblax û hêdî hêdî belavbûna bîra rizgarîxwazî li Kurdistanê, di dilê Mîrza Qutas de ronahiyek peyda kiribû û hêviyek wî ya zêde ji dahatû re hebû. Mîrza Qutas çûbû Seblax û li wir bi nehênî bûbû endamê Komeleya J. K. û ji aliyê Komeleyê ve jê re serokatiya liqa Berdereşê û derdora wê hatibû dan. Dema ku Mîrza Qutas xeber dida, ji bo tesîrê li ser ew kesên di meclisê de ne bike, gotinên farisî, erebî û kurdî têkel dikirin.
Piştî ku xêrhatinî bi Şêrko û Pîrût da û xwarin da wan, ji wan pirsî:
- Oxira we a xêrê be, ka bifermin em bizanin em bizanin hûn ê bi van sîlehan biçin heta ku?
Şêrko, ji bo ku nasiya wî bi Mîrza Qutas re hebû, çend caran çûn û hatina wî çêbibû û baweriyek wî ya zêde pê hebû,

ji serî heta binî her wek ji babê xwe re bêje hemû serpêhatiyên
xwe jê re gotin. Piştî ku gotinên xwe temam kirin, jê re
got:
- Belê ezbenî, hal û ehwalê me bi vî awayî ye, niha em hatine
mala te û bi te bişêwirin û ji me re çi feydeye wê bêjî û
73
em bikin.
Mîrza Qutas qasekî ponijî, melheze kir û ket nav bîr û xeyalan.
Enîşkê xwe danî ser ranê xwe, destê xwe da ber çavên
xwe û pişt re destê xwe bi rûyê xwe de anî xwarê û got:
- Welleh ez jî li insanên wek we digeriyam û va Xwedê
hûn ji min re şandin. Babê min, we qet navê Komeleyê sehkiriye?
Pîrûtgot:
- Belê min seh kiriye. Dibêjin dijminê axatî, reîs û meyîsê
'eceman e û xelkê digot şelandin û kuştina fermanderê eskerî
yê Seqizê jî karê Komeleyê ye...
Mîrza Qutas hinekî berken bû û got:
- Berê hemû tiştê Komele dijminê hemû 'eceman nîn e,
tenê dijminê wan reîsan e ku zulm û zorê li millet dikin. Komele
rêbirî û kuştina kesên bê xeta û bê guneh karekî xirab û
qebehet dihesibîne. Wisan dixuyê hê hûn baş Komeleyê nas
nakin. Vêca guhên xwe bidin min û ez ê ji we re bêjim:
- Ez ji axayê xwe re bêjim, Komele ji bo azadî û îstîqlala
kurdan hatiye avakirin. îddîa dike ku, dibê malê milletê
kurd di destê wî de be, bi zimanê xwe xeber bide, sen'et,
avahî, kultur û karên tibbî li Kurdistanê pêşde biçe. Komele
dixwaze jendirme û ajanên biyanî hakimiyeta xwe li ser milletê
kurd rakin, muqeddesat, orf û adetên kurdî neyên rencîde

kirin...
Gelek pêwistiya Komeleyê bi xortên wek we heye, ji bo ku hûn jî bêçare û derbeder bûne, ji bilî Komeleyê pişt û penayek we tune. Werin daxilê Komeleyê bin û di riya wê de ji bo fedakariya ruhê xwe amade bin.
Şêrko ku gelek bi hişyarî guhê xwe dabû gotinên Mîrza Qutas û got:
74
- Bi rastî me jî navê Komeleyê seh kiriye û me dixwest em di derheqê wê de zêdetir bizanin û gelek baş bû ku te em serwext kirin. Lê, emê çawan xwe bi mirovê Komeleyê bidin nasîn û emê wê çawan peyda bikin?
Mîrza Qutas dikir ku bersîva Şêrko bide, lê Pîrût berî wî dest pê kir û got:
- Kekê min, bi Xwedê ez bi wê razî nîn im. Niha dewran guheriye, welat têkelhev bûye û kes-kesayetî ye. Çek ketiye destê beşa piraniya kurdan. Hinek mijûlin ji dijminê xwe tole vedikin û hinekên din li ser riyan di bin beran û di kuncan de xwe bêdeng kirine û dixwazin bin û bintarê dewlemendan rût bikin. Çiyê me ji wan kêmtir e! Tivinga me? heye, em di kuştinî û rêbiriyê de bêkêr in? nexêr em ne bêkêr in. Mîrza Qutas, tu dizanî dema ku me reîs kuşt û bi kek Şêrko re Mîne Axa daliqand, me çi zewqek jê sitand!! Tu tişt ji wê xweştir heye ku tu destê xwe bavêjî pêsîra dijminê xwe û serbikevî û wî bifêwtînî. Ne, ne bira, were em bi serbestî û bi azadî bijîn û serî ji tu kesekî re netewînin...
Mîrza Qutas, ku çavên xwe kiribûn nav çavên Pîrût û gelek bi hişyarî guhê xwe dida wî xortê xwîngerm, li gor mantiqa

xwe dest bi xeberdanê kir û jê pirsî:
- Çend axayên ku dijminê te ne hene?
Ji bo ku Pîrût mebesta pirsa Mîrza fehm nekiribû, got:
- Du kes hene, yek ji wan niha li Cehennemê piyên xwe
dirêj dike û yê din jî hê maye.
Mîrza Qutas:
- Ê baş e, ew hemû axayên ku xwîna bi sedan hezaran
gundiyan dimijin, dijminê te nîn in? Gelo ji bo ji wan tolevekirana
xelkê tu ne amade yî?
Mîrza Qutas nehişt Pîrût bersîva wî bide û ji bo ku wî hê
75
baştir têbigihîne, cardin jê pirsî:
- Tu dixwazî bi çekê xwe ve bi azadî û bêyî kesek ji te re
bibe asteng bigerî?
Pîrût bi sehkirina van pirsan, wisan zanî ku Mîrza Qutas jî
eynê wek wî difikire, bersîva wî da û got:
- Eê, ez çi dibêjim? Ez bi zimanê 'eceman xeber didim!
Mîrza Qutas cardin Pîrût da ber pêlên pirsan û jê re got:
- Gelo tu dixwazî hemû wextê kincên kurdî li xwe bikî?
Gelo tu dixwazî mirovên xwe ji bindestî û talanê xelas bikî?
Gelo tu dixwazî bi azadî li mala xwe rûnî? Gelo tu dixwazî
bera zehmet, cefa û keda te ji te re bimîne û tu têr û tejî bî?
Gelo tu dixwazî...
Mîrza Qutas dixwest çend pirsên din jî jê bike, lê Pîrût gotina
wî birî û bixeyîd jê re got:
- Mamê Qutas, wisan dixuyê ku tu min ker hesêb dikî,
axir ez jî eynî tiştî dibêjim û ji ber wê ye ku ez dixwazim derkevim
serê şax û çiyan, bi serbestî bijîm û serî ji kesekî re rietewînim.

Pîrût di dilê xwe de gelekî kêfxweş bû ku bîrûbaweriyên
Mîrza Qutas jî eynî wek yên wî ne. Mîrza Qutas ev fehm kir
û piştî demek bêdengiyê, got:
- Ne xortê delal, me'neya gotinên min bi wî awayî nîn e
ku te fêhm kiriye. Rêbirîn û li şax û çiyan mayîn netîceyekê
nade, tu tenê bi serê xwe nikarî tiştekî bikî. Te seh kiriye ku
dibêjin: "bi gayekî tenê gêre nabe", te bi çavên serê xwe di
dema şelandin û kuştina fermanderê eskerî de birîndariya
hevalê xwe dît. Em ferz bikin ew hevalê bimiriya yan ew nebûya
tu bûya. Wê çaxê hem tu pê şermezar dibûyî û hem jî
xwîna we bêfeyde dihat rêtin. Di dema rêbirî û şer de insan
hemû wextê bi ser nakeve. "Cêra avê hemû wextê ji kaniyê
76
saxlem venagere", ev meseleke meşhur e.
Xerez ew e, irsan bi rêbirî û kuştinê dikare du-sê kesan bikuje,
yên mayî dê çi lê bên? Nexêr 'ezîzê min, ew riya te daye
pêşiya xwe riyeke rast, saxlem û baş nîne. Riya rast ew e
ku, tu ne tenê ji bo nefsa xwe belko ji temamê civakê re bixebitî
û qazanc û menfeetê bigihînî millet. Wê çaxê jî eger
tu di wê riyê de bê kuştin tu dibî şehîd, toleya te tê vekirin û
navê te dikeve nav rûpelên dîrokê...
Mîrza Qutas qasekî bêdeng ma û cardin dest pê kir û got:
- Te qet seh kiriye ku hemû erbab ji Komeleyê ditirsin?
- Belê min seh kiriye.
- Haa... gotin li ser vê cewherê ye. Eger ji rêbir û şer an ji
min ji te tenê erbabek bitirse, ji Komeleyê hemû erbabên zalim
û qatil ditirsin. Bi navê Xwedê, ziravê jendirme û ajanan
jî jê diteqe û ji tirsa Komeleyê ji bo xwe bisitirînin li kûnên

mişkan digerin...
Wê navê re Şêrko, ku heta wê demê bêdeng mabû, carek din pirsa xwe dubare kir û got:
- Dê baş e emê çawan mirovên wê komeleyê peyda bikin?
- Ezbenî ez yek ji wan im, ez amadeyê xizmeta we me û werin ez ê kar bidim we û we bibim Sablax...
Dema ku Pîrût ev gotin seh kirin, çav li Şêrko kir û gelek lê 'ecêb hatibû ku Mîrza Qutas mirovê Komeleyê ye. Li gor Pîrût, mirovên Komeleyê xwediyê reng û rûyekî taybetî ne. Ji ber vê gelek bi 'ecêbmayî pirs kir:
- Kek Mîrza, çawan, tu jî Komele yî, erê çima tu nîşanek bi te ve nayê dîtin?
- Xortê delal, nîşana Komeleyê di nav çavê insan bi xwe de nivîsandiye, dibê di dilê însên de cî girtibe. Komele jî ji insanên wek min û te pêk hatiye.
77
- Êêê baş e, "karê" te çiye ku dê tu bidî me? Dê tu niha wê muhur bikî?
Mîrza Qutas dest bi kenê kir û got:
- Ne berxê min, ez tu muhur pê ve nadim, karê te kaxezeke, tu wê dikî paxila xwe û ew dibe heval û hogirê te, ew dibe namûs û şerefa te. Tu di nav millet de bi wê rûpela kaxezê tê nasîn.
Gotinên Mîrza Qutas ên sade lê pirr bi me'ne û zelal di dilê Pîrût de cî girtin. Pîrût, bi dilxweşî û serbilindî eynî wê demê bi Şêrko re amade bû ku bi destê Mîrza Qutas bibe endamê Komeleya J. K. Li ser vê, li gor adetan heft caran bi Qur'anê sond xwarin ku, di riya armancên Komeleyê de ji

fedakirina ruhê xwe texsîratî nekin...
Şêrko û Pîrût çend rojan bi mêvanî li mala Mîrza Qutas man û pişt re xwediyê malê ew girtin û bi xwe re birin Sablaxe... Ew sê kurd bi dilekî gelekî bihêvî û bi daxwazeke xweş ji Dolê (Geliyê) Besrî serketin û Sablax pêş wan ve xuya kir. Mîrza Qutas hem rêber û hem jî rîsipiyê wan herdu xortan bû. Ji ber wê her tim çavê Şêrko û Pîrût li devê wî bû ku tiştekî bêje û ew jî pêk bînin. Te digot Mîrza Qutas di dilê hevalên xwe de ye, ji ber vê dest bi axaftinê kir û got:
- Ez bi ax û huzura mubarek bikim va em gihîştin Mahabadê. Ka vêca werin em bikevin nav Baxê Qazî hinekî bêhna xwe vedin heta tarî dadikeve, pişt re emê herin bajêr mala Kek Siwar û we pê bidim naskirin. Kek Siwar mêrekî hêja ye, endamekî çeleng û bi nav û deng ê Komeleyê ye û em bi
78
riyawî bi Komîteya Merkezî re danûsitandin datînin...
Mîrza Qutas, piştî ku tarî bû ji aliyê Gerawan ve ket nav bajêr û çûn mala kek Siwar a li Taxa Xirî. Kek Siwar li mal nebû. Maliya wî mêvan birin jor û ji wan re got dê niha mêrê wê jî bê. Mêvanan hê şûşeyek çay venexwaribûn Kek Siwar ket hindur û gelek bi germî xêrhatinê bi Mîrza Qutas û hevalên wî da.
Mîrza Qutas, ji bo ku bi Kek Siwar bide fehm kirin ku hevalên wî jî ne xerîb in, endamên Komeleyê ne û dikare piştrast be û bê girê û asteng biaxive, bi vî awayî got:
- Birader, ev herdu xortên han, ku navê vî delalê han Şêrko û yê vî delalê han jî Pîrût e, bûn endamên Komeleyê, ji ber vê tu dikarî bi awakî vekirî bi wan re sohbet bikî. Navê

Şêrko yê nehênî "Azer" û yê Pîrût jî "Bira" ye...
Kek Siwar gelek pê dilxweş bû û bi berken got:
- Vêca Mîrza Qutas, tu ku kesekî hevbîr û heval nebe qet tînî mala min. Çawan çavê min bi wan ket min zanî ku ew heval û hevriyên me ne û dirubê welatparêziyê bi wan ve heye, hûn gelek gelek bixêr bên...
Mîrsa Qutas serê xeberdanê daxist û got:
- Ev herdu xortên han gelekî bêçare mabûn û hatin mala min ku ez tedbîrekê ji wan re bibînim. Min jî biryar da ku ez ew bikim endamê Komeleyê û bînim vir.
Pişt re mîrza Qutas serî heta binî hemû serpêhatiyên Şêrko û Pîrût ji kek Siwar re neqil kirin û wiha domand:
- Ew nikarin êdî li gundê xwe rûnin, tu şik tune ku niha jendirme û axa wek seyên har li wan digerin ku wan bigrin û ceza bikin. Bila şikirandin tê de tunebe, lê li derûdora Seqizê hê jendirme dikarin mudaxeleyê hemû awayê kar û barên kurdan bikin. Ez hêvîdarim ku hûn bikarin wan li vir bipa-
79
rêzin, bêguman dê ew hemû emir û daxwazên we bicî bînin û nahêlin mamê wan Qutas şermende be...
Dema ku Komeleyê li hemû ciyê dest bi têkoşîna nehênî kir, pêwistiyek zêde bi xortên aza, serînetewandî û têkoşer hebû. Endamên Komeleyê yên berpirsiyar lib lib ber bi navçeyên cîhê cîhê yên Kurdistanê ve dîçûn ku şaxên Komeleyê damezrînin û zêdetir xelkê ber bi xwe ve bikêşin. Di beşa piraniya Kurdistanê de hê jendirme, ajan û li çend ciyên din jî beşên ordiyê û her wiha kesên xwedî milk ên zordar û welatfiroş destê wan dirêj bû û bi hemû hêzên xwe ve li ser

riya avabûna Komeleyê asteng û dijîtî pêk dianîn. Çi gundiyekî li hemberê zulm û zordestiya ji heddê xwe derçûyî ya xwedî milk lêvên xwe jî ji ser hev rakiriya, bêgotin navê Komeleyê pê ve dizeliqandin û dihat girtin. Hetta axayek li navça Şarwêranê ji bo ku ji gundiyên din re gotibû werin em biçin têkevin nav Komeleyê guhê kurmancekî birî bû.
Kovara Niştiman, ku belavkerê bîr û baweriya Komeleyê bû, nû dest bi weşana xwe kiribû û belavkirina wê di seranserê melbendên Kurdistanê de li ser milê berpirsiyarên Komeleyê wezîfeyek gelek giran, zehmet û cefa bû.
Rûniştiyên Kurdistanê, bi taybetî gundî bi awakî nedîtî di pê bîr û baweriya nûrterên Komeleyê de diçûn û bi dil û can endametiya wê qebûl dikirin, çiqas ji wan bihatiya ewqas zêde heqê xwe yê endametiya Komeleyê û alîkarî ji sandoqa Komeleyê re dikirin.
Derketina hejmara yekê ya Kovara Niştiman wek dengê birûskê di serarserê Kurdistanê de deng da, çi kesên hinekî jî bûya xwendina wan hebûya, yên xwedî milk, tucar, mela, feqî û xwendewar ji hemû milan ve hewil didan ku hejmarek wê bidest bixin. Niştiman li ser destan digeriya. Ew helbes-
80
tên tê de dihatin belav kirin, bi taybetî ew munaqeşeyên Bayîz û Bapîr ku bi awakî kûr û xumalî derdê hindur dida xuyakirin û axatî û serokeşîretên welatfiroş didan ber pêlên rexne û lomeyan, ew hetta ji aliyê nexwendewaran ve jî dihatin jiberkirin û li her cihî behsa Bayîz û Bapîr dihat kirin.
Komîteya Serokayetiya Komeleyê li hemberê daxwaz û ruhiyeta rûniştiyên Kurdistanê pê re nedigihîşt ku kovara Niştiman

bigihîne hemû cihî, ji ber vê gelek îhtiyaca wan bi
xortên mêrxas, têkoşer û aza hebû ku bi riya wan bi hemû
teşkîlatên xwe re peywendî dayne û kovara Niştiman di nav
kurdan de bide belav kirin.
Kek Siwar bi van xortan gelek kêfxweş bûbû û di dilê xwe
de digot: "ew ji me re gelek pêwist in û dikarin karekî gelekî
zêde ji me re bikin...". Kek Siwar berê xwe da Mîrza Qutas û
got:
- Emê sibe êvarê Azer û Bira bigrin û biçin ba Kek Bînayî.
Dê hevalên din jî bên wir û ew çi bêjin emê wisan bikin. Ez
bawerim ku dê xêrhatinek gelek germ li wan bê kirin...".
Ciyê Komîteya Serokatiya Komeleyê li taxek Sablaxê di
mala mirovekî herî dewlemend de hatibû bicî kirin. Ew mirovê
dewlemend, di dema Riza Xan de gelek eziyet dîtibû û
tenê piştî têkçûna dîktatoriyê karîbû nefesekê bistîne. Ew ji
dil mirovekî welatparêz û kurdhezker bû. Bi nehênî alîkariyek
gelek zêde ji Komeleyê re dikir, lê kesekî şik jê nedibir
ku ew welatparêz e. Ji ber vê jî Komîteya Serokatiya Komeleyê
xaniyê wî ji navenda têkoşîna xwe re helbijartibû ku ji
çavdêriya dijmin dûr bikeve. Çend deriyên wî xaniyî hebûn,
temamên endaman ciyê wê nedizanîn û hetta beşa piraniya
endeman hevûdu jî nasnedikirin. Her yek ji wan bi serokê
komîteya xwe û bi çend kesên din re peywendiyên wan he-
81
bûn.
Roja din êvarê Kek Siwar û heval çûn, dema ku gihîştin
kolanekê ji wan re got:
- Hûn li vir bisekinin heta ku ez têm.

Qasek derbas bû Kek Siwar hat û heval dan pê xwe û meşiya û nêzîkî deriyekî bû, çar caran lêxist û derî vekirin. Di nav xaniyekî tarî de meşiyan û pişt re çend kapangan derketin jorê û çûn odeyekê. Di odê de çirayek fitîl diteyîsiya, kesek li wir tunebû û çend kursî li ortê hatibû danîn. Di koncek odê de perdeyek bi dîwêr ve hatibû daliqandin û berê hemû tiştên wê perdeyê bala Şêrko û Pîrût kêsa. Gelek bi dîqqet li perdeyê dinêriyan ku, ji nişkave ji pişt wan ve mirovek ket hindur û got:

-Şevbaş!

Kek Siwar û Mîrza Qutas di cî de rabûn piyan û Şêrko û Pîrût jî ji ciyên xwe rabûn. Ji awa û sekna Kek Siwar û Mîrza Qutas dihat zanîn ku ew mirovekî mezin e, mimkun e ew Bînayiyê ku li mala Kek Siwar behsa wî hat kirin ew be...

Hê hemû li piyan sekinîbûn, Kek Siwar hilda û got:

- Qurban, ew herdu xortên ku min ji we re erz kiribûn ev in û ji bo xizmeta we hatine.

Kek Bînayî mirovekî bejindirêj, çarmil û qelew bû. Temenê wî xwe li çil-çilpênc salan dida û riyê xwe yê kehrebarî û tenik hinek berdabû û daîma berken bû û vê hinek din jî wî xwînşêrîn û xweşik kiribû. Cilûbergê melan ê sade lêbûn û ger kesekî nenas ew bi vî halê ve bidîta dê bigota ew feqiyê hejar ê Mizgefta Rûstem Begê ye.

Kek Bînayî berê xwe da xortan û ji wan pirsî:

- Xortên delal navên we çi ne?

- Qurban Şêrko û Pîrût.

81

Dema ku Kek Bînayî ev nav seh kirin, bi awakî nejidil li

Kek Siwar û Mîrza Qutas nêrî û wan ji çavên wî derxistin ku dibêje: "we ew perwerde nekirine, wisan dixuyê ku we navê nehênî jî li wan nekiriye...".
Mîrza Qutas pê hesiya ku Kek Bînayî ew qels dîtin, hilda ûgot:
- Qurban, bibexşîne navên wan ên nehênî Azer û Bira ye. Bi rastî min terkexemî kir ku ez wan têbigihînim û ji wan re bêjim ku dê hûn ji vir şûn de navên xwe yên nehênî bi kar bînin.
Ev gotinên han li Şêrko û bi taybetî jî li Pîrût gelek ecêb hatibûn û qet hîn nebibûn ku bi navekî din bên bangkirin. Kek Bînayî wek ku fikra dilê wan xortan de xwendibe dest bi xeberdanê kir û got:
- Lawên min, rûyê dinyayê res be, lawên kurd ji bo ku bikarin xwe ji destê dijmin biparêzin hinek caran mecbûr in navên xwe yên eslî danin milek û navên din li xwe bikin. Gereke ev bêhna we teng neke û divê hûn bizanin ku heta rêxistina me bi tevayî eşkere nebe navê we Azer û Bira ye û tenê bi van navan bangî hevûdu bikin ku hûn hîn bibin. Dê kek Azer û kek Bira, ka bêjin we fermanderê eskerî yê Seqizê û Mîne Axa çawan kuşt. Ev karê we kiriye li serarnserê Kurdistanê deng daye. Zurnevanên Tehranê, piştî kuştina Xwocendî digotin ku ev karê Komeleyê ye, lê piştî Mîne Axa hat kuştin û hûn herdu wenda bûn, êdî dev ji Komeleyê berdan û niha tenê navê Şêrko û Pîrût heye. Van rojên dawiyê li derûdora Seqizê çend karwan hatin şelandin û çend jî jendirme hatin kuştin, wan tevan jî kirin sitoyê we. Birayên min, niha hûn qehremanê rojê ne û li hemû ciyê li we digerin...

Dema ku Şêrko û Pîrût ev seh kirin, şaş man û li hev nêrîn
83
û di dilê xwe de digotin: "wî çi zû pê zanî...".
Şêrko dikir ku bersîva pirsên Kek Bînayî bide, lê mîrza
Qutas dest bi xeberdanê kir û got:
- Qurban, kek Bira bi tu wechekî hazir nedibû ku bi me
re be û her dixwest biçe kuştin û şelandinê bike, lê bendeyê
we ew têgihand ku ev karekî bêfeyde ye...
Kek Bînayî rabû piyan û bi destê xwe perdeya ku bi dîwêr
ve hatibû daliqandin, da milekî û çawan mamoste ji xwendevanên
xwe re dest bide, bi wî awayî berê xwe da Şêrko û
Pîrût û gelek bi hişyarî û hêdî got:
- Ev nexşa ku hûn dibînin a Kurdistanê ye, yanê ya welatê
kurdan e ku niha hatiye çar perçe kirin û di bin hukmê biyaniyan
de ye. Çerxa 20'an ku çerxa bidestxistina rizgarî û serbestiya
gelên cîhanê ye erkek mezin kiriye ser milê nesla neteweyê
kurd a îro. îro neteweyê kurd ji hemû neteweyên cîhanê
zêdetir paşketî, lêqewimî û bêmafe, lê nêrîna bîr û ruhiyeta
destxistina rizgarîxwazî û serbestî di nav neteweyê me
de kok avêtiye. Tu bi kîjan kurdê re biaxivî di dilê xwe de li
hemberê dagîrkeran bi kîn e xezeb e. Karzanî, azayetî, netirsî,
liyaqat û nesersarî nîmetek Xwedê ye ku çavkaniya wan ji
koka kurdan tê û têkelê nav şîrê dayîka me bûye. Vêca komela
me ava bûye ku, ji bo rizgariya kurd û Kurdistanê ji
destê dagîrkeran bîr û ruhê rizgarîxwaziyê bi xesletên taybetî
yên kurdan re, ku min behs kirin, têkel bike û di tekeriyekê
de pêşde bibe. Vêca ev jî bi gotin, mezintî û xwefişkirinê nabe.
Li gor gelek kesan wisan e ku tenê bi gotina ez kurd im,

tivinga min heye û ez kurdîtiyê dikim dê, bibe têkoşer û şoreşger.
Ne, ev ne wisan e, mirov wisan hêsanî nikare bibe têkoşer
û şoreşgerê azadî û serxwebûnê. Têkoşer û şoreşgerên
azadiya gel serbilindî û îftîxarek gelek mezin ên însaniyetê ne
84
û ji bo gihîştîna wê serbilindiyê dibê dibistana têkoşer û şoreşgeriyê
re derbaz bibe û bikare ji hafa berjewend û ceribandinan
derbaz bibe. Şoreşger, ji wan kesan re dibêjin ku temamê
jiyana xwe ji bo xizmeta bextewerî û se'adeta gelê xwe
amade kiribe, ji wan kesan re tê gotin ku xwe ji tu hevraz û
nişovên jiyanê nedabe alîkî, xwe ji xelkê cihê nekiribe, ji xelkê
piştsitor be, dahatûyê bi çakî, baş û ronahî hîs bike, dost
û dijminên xwe ji hev cihê bike. Di dema pêwistiyê de pêşde
biçe û dema ku paşvekêşan pêwîst bû dest û piyên wî li hev
neale, ruhiyet û jîndariya xwe wenda neke, hêviyên xwe
nebire û hêzek nû ya ji bo berbipêsveçûnê berhev bike. Bi
kurtî dibê şoreşger xwediyê bername, helwêst û armancek eşkere
û ronak be. Ji bo hemû ev pêdawistiyên şoreşgêriyê dibê
dibistana wê bê damezrandin ku ew jî partiyek pêşkevtî ye.
Komeleya me di vê riyê de têkoşînê dike...
Niha ku hûn hatine dikevin nav sefên wê, berê hemû tiştî
dibê hûn jidil bibin şoreşgerê wê riyê û dibê hûn hêdî hêdî
dîroka bijarte ya netewe û welatê xwe hîn bibin û şarezayê riya
berbipêşveçûna şoreşa wê bin...
Wê navê re xortekî xwînşirîn, rehsivik, çavbelek û simbêlreş
ket hindur. Çavên wî wek sitêrkan dibiriqîn. Berkenek
tejî ji behs û xeberên xweş li ser lêvan bû. Ev berkenek ewqas
sipehî û xweşik bû ku te digot hemû uzwên bedena wî pê re

dikene û mizgîniya serkevtinek mezin dide. Pêşî Kek Bînayî û pişt re jî yên din ji berve rabûn. Kek Bînayî berê xwe da wî û got:

- Kek Hêmin, şukir xêr e, ka ji me re bêje em bizanin...

Ew xortê hunerê tazegihiştî, lê meşhur û bi nav û deng ê Kurdistanê, Mihemmed Emînê Şeyxulîslam bû ku pişt re bû endamê Komeleyê û navê Hêmin lê hat kirin. Rêz û hezkiri-

85

nek taybetî ya Kek Bînayî ji Hêmin re hebû, pê serbilind bû û îftîxarê pê dikir. Qewîtî dikir ku hemû şiîrên bi pirme'ne, baş û spehî yên Hêmin jiber bikin û bikin programa têkoşîna xwe. Hêmin hê di gava yekê ya têkoşîna xwe de wek şairekî netewî û civakî bîr û baweriya xelkê ber bi xwe ve kêşabû. Çunkê helwêstên wî di rasteqîniya xwe de bûbûn eynika dilê civatên gel û danexuyakirina bîr û daxwazên wan. Hêmin hê ji roja yekê ya têkoşîna jiyana xwe ve ji bo parastin û pêşdebirina zimanê bab û kalan ê kurdî zendên xwe radabûn. Helbestên xwe bi zimanekî sade dihûnandin û bi zimanê gel xeber dida. Vêca Kek Bînayî lê qewîtî kiribû ku di ciyê gelek bêjeyên farisî û erebî yên di dema xebata siyasî de tên bikaranîn, bêjeyên kurdî bên dîtin û bikaranîn. Hêmin ji serokatiya komîsyona vê xebatê re hatibû tayîn kirin. Hêmin bersîva Kek Bînayî da û got:

- Qurban, welleh xeberek ewqas xweş li ba min heye ku eger ez ji we re bêjim mimkun e hûn bawer nekin. Va du roj bûn min hejmarek biraderên xwendewar, hunermend, pispor û zimannas berhev kiribûn ku em bizanin ka di zimanê kurdî de di ciyê bêjeyên serbaz, nîzamî, esker, mucahîd û fedayî

de em kîjan bêjeyê bikarbînin. Em gelekî li ser peyivîn, girê û astengek mezin peyda bû, lê em negihîştin netîceyekê, em hemû westiyan û me daxwaza çayê kir. Kalekî dinyadîtî ji me re çay anî û bi ken ji me re got:

- Hema ez nexwendewar jî bim, ma ez ê bibim kafir ku ez bizanim ka gelo girê û astenga we li ser çi bû?

Me bersîva wî da û jê re got ku, nexêr tam eksê ku tu dibêjî, mimkun e tu bikarî alîkariya me jî bikî. Vêca bêje ka em bizanin mirov di kurdî de ji serbaz re çi dikare bêje? Pîremêr cardin keniya û got:

86

- Bêbela be, we xwe ji bo vê ewqas aciz kir. Ma we seh nekiriye ku di nav kurdan de ji mirovên canfeda re "pêşmerge" digotin.

Belê, ez hatime ku vê ji we re bêjim. Çunkê ez dizanim ku hûn gelek ji xeberên wiha hez dikin. Ew gotin gelek bi dilê kek Bînayî bû. Bi xwe jî çavên wî tejî rûndik bûn û bersîva Hêmin da û got:

- Bêmafî, zulm û zordariya bêhed û bêsinor hemû kurdên xwedî şeref kiriye welatparêz û ew ruhê welatparêzî piştivaniyek xurt ji bo bidestxistina azadî û serxwebûniya gelê kurd peyda kiriye. Vêca bizane wî kalê nexwendî heta çi dereceyê xwediyê wê ruh û hîsa welatparêziyê ye ku ew bêjeya sipehî û pirr bi me'ne li ser ferhenga zimanê neteweyê me zêde kiriye. Bi rastî dema ku mirov vê gotinê seh dike, xwe bi xwe kurdekî serînetewandî, aza, bikêr, netirs û karzan dibîne û hêviyên wî zêdetir û qahîmtir dibe. Ez hêvîdarim ev herdu xortên han jî ku hatine ba me cewherek wan hebe ku em ji

wan re bêjin pêşmerge...
Şêrko û Pîrût ku gelek bi hişyarî guhên xwe dabûn van gotinan, ecêbmayî mabûn. Ji Pîrût webû ku ev gotinên han di xewnê de jê re tên gotin. Wî tu carî ew gotin seh nekiribûn, gelek ew gotinên ji aliyê kek Bînayî ve hatin gotin qet fehim jî nekiribû, çunkê kek Bînayî bi kurdiyek paqij û sade diaxift. Kek Bînayî li ser çend behsên din jî xeber da û pişt re ji wan re got:
Baş e îro bes e. Kek Siwar ez Azer û Bira dispêrim te. Bila bi roj bigerin û bîhna xwe vekin, bi şev jî ji bo sohbetê bînin vir. Bila deh-panzdeh rojên xwe bi vî awayî derbaz bikin, hinek siyasetê hîn bibin, rewşa welatê xwe nas bikin û pişt re emê wan îmtîhan bikin.
87
Êdî nêzîkî paşîvê bû û her çar derketin û hatin mal. Di rê de Pîrût berê xwe da Şêrko û got:
- Ê baş e Şêrko te tu ji wan gotinan fehm kirin gelo?
Mîrza Qutas nehişt Şêrko bersîva wî bide û hilda û got:
- Kek Bira, ev nebû, qerarê me çibû, ma tu nizanî navê wî axayê delal Azer e.
Pîrût hinekî sor bû û dengê xwe nekir.
Şêrko û Pîrût çend rojên xwe bi vî awayî derbaz kirin. Bi roj diçûn bajêr û li nav bazarê digeriyan, li qehwexaneyê rûdiniştin û bi şev jî bi kek Siwar re diçûn Komeleyê û kek Bînayî di derheqê kurd û Kurdistanê de bi wan re sohbet dikir. Rojekê li qehwexaneya ser Çemê Sor rûniştibûn, temaşe kirin ku hemû kes behsa çend serokeşêrîtên welatfiroş dikin, ku siwarên xwe li derûdora Sablaxê berhev kirine û dixwazin

bi şev êrîşê bînin ser bajêr û wan talan bikin. Qazî jî mirovên xwe belavê nav bajêr kiriye ku çi kesên destên wan tiving digire, bila êvarê rahêjin tiving, tabance û xencerên xwe û çaraliyên bajêr bigrin û nehêlin siwarên eşîretên welatfiroş bikevin nav bajêr. Şêrko û Pîrût bêsekin ber bi mala kek Siwar ve ketin rê û tiştên ku seh kiribûn ji xwediyê malê re gotin.

Pîrût got:

- Erê kek Siwar, ew Qazî kî ye ku xelk bi wî awayî bi hurmet behsa wî dike û pê wî de diçe?

- Kek Bira, Qazî Sablaxî ye, ji binemaleke gelek maqûl û bi nav û deng e, xizmetkarê kurdan e û çend sedsal e xizmeta vî neteweyê dikin, di vê riyê de fedakariyek zêde kirine û qurbanan dane. Di vê têkelhevî, girê û astenga niha de xelkê Sablaxê Qazî ji bo mezintiya xwe helbijartiye, bawerî û îmana wan pê heye û ji gotinên wî dernakevin. Qazî bi şev û bi roj bêsekin ji bo temînkirina hêminî, asayîş û jiyanek xweş ji

88

xelkê xwe re têdikoşe, hewil dide, dixebite û riya baş nîşanê wan dide. Hetta bi şev jî sekin nizane, li nav bajêr digere û bi xortên canfeda yên din re derd û êşa xelkê dikêşe ku nebe dijmin xewa şirîn li wan heram bike...

Pişt re kek Siwar ji wan re got:

- Haa, baş bû bîra min ket, kek Bînayî cewab şandiye ku em îşev hinekî zûtir biçin balê û tivingên xwe jî bi xwe re bibin. Dema ku bû êvar û tarî daket, hersêkan tiving û rextên xwe hilgirtin û çûn Komeleyê. Dema ku ketin hindur dîtin ku kek Bînayî şal û çoxeyek gewr li xwe kiriye, tabanceyek lagan a tazî kiriye ber piştîniya xwe û li hêviya wan e. Çawan

çavê wî bi wan ket, got:
- Kek Siwar, tu here li ba mirovên xwe yên li taxa te ne û
ez ê Azer û Bira bi xwe re bibim.
Kek Bînayî herdu xort birin û ket nav bajêr û ji kolanekê
derbazî kolaneke din dibû û ji taxekê diçû taxeke din. Ewqas
kişt, sivik û geş bû ku Şêrko û Pîrût bi wê xortîniya xwe nedigihiştin
wî û bihîn li wan diçikiya. Dema ku kek Bînayî
dît hevalên wî westiyane, li ser dikekê sekinî û ji wan re got:
- Dê ka em hinekî bihna xwe vedin, pişt re emê herin rexê
bajêr.
Di esnayê bihînvedanê de Pîrût got:
- Kek Bînayî, eger temamê xelkê bajêr wek te ji gotinên
Qazî dernekevin, hişyar bin û herestiyê bikin, ne tenê siwarên
eşîretan, leşkerê tu dewletê jî nikare êrîşê Sablaxê bike.
Ku tu wiha yî ka gelo niha Qazî çawane?
Kek Bînayî bi sehkirina van gotinan berken bû û qet dengê
xwe nekir. Pişt re Pîrût cardin dest pê kir û got:
- Erê bas e, mala Qazî li ku ye? mirovekî çawan e û navbe-
89
ra wî û Komeleya me çawan e?
Kek Bînayî bersîva wî da û got:
Eger navbera wî û Komeleyê xerab bûya, me bi gotina
wî herestiya bajêr nedikir û emê biçûna di nav lehêf û doşekên
xwe yên nerm de raketina.
Pîrût cardin pirsî:
Erê kek Bînayî, Qazî endamê Komeleyê ye?
Wisan dixuya ku hemû pirsên Pîrût bi kêfa kek Bînayî nebûn,
ji ber vê jê re got:

Lawê min, tu wextê hewlê hînbûna her tiştî nede, hekene
dê pora serê te gelek zû sipî be û dê tu gelek zû kal bibî...
Pişt re kek Bînayî destmalek pêçayî ji bêrîka çoxeya xwe
derxist û got:
Azer, Bira niha hûn birçî ne, ka bi min re hinek nan, penîr
û pîvazên hêşîn heye, werin em bixwin û pişt re emê rabin
û ber bi qeraxê bajêr ve biçin û bi hev re serekî li heresan
bidin.
Çend şevan heta beyana sibê kek Bînayî û ew herdu xort,
li nav bajêr û derûdora wê digeriyan. Her sev kek Bînayî şal
û çoxeyekî din li xwe dikir û bi awakî rengê xwe diguherî û
hetta eger Şêrko û Pîrût ji nişka ve rastê wî bihatina nedikarîn
wî nas bikin.
Xelkê Sablaxê yê qehreman bi hişyarî û cansîperaneyek
taybetî heresiya bajarê xwe dikirin. Ji ber vê, dema ku serokeşîretên
welatfiroş ev hîs kirin mecbûr man paş de bikêşin û
bi xwe re nedîtin êrîşê Sablaxê bikin.
Şêrko û Pîrût bi awakî wisan hînê rabûn û rûniştina kek
Bînayî bûbûn ku te digot ji zaroktiya xwe ve ew nas dikirin.
Kek Bînayî ne tenê wek mamostayekî, belko wekî hevalekî
herî nêzîk û sade bi wan re dida û distand û di dema rabûn,
90
rûniştin û meşê de qet xwe ji wan jortir nedidît. Her çendîn
bi temen 10-15 salan ji wan mezintir bû jî, lê xwe wek destebirayekî
wan dihesiband û hemû awa henek û tinaz bi wan
re dikirin. Sêrko û Pîrût jî, eger hûn rastiyê bixwazin êdî wek
berê şermîn nebûn û raste rast pê re xeber didan û pê re henekjîdikirin...
Rojekê Şêrko û Pîrût li qehwexaneyê rûniştibûn, dîtin ku

xelk dibêje îro dê milet li Çarçirayê berhev bibe û dê Qazî ji
wan re biaxive. Ew jî ji bo daxwaza dîtina Qazî û guhdarîkirina
gotara wî bi lez xwe gihandin Çarçirayê û li nêzîkî wê
kursiya bilind ku li wir hatibû danîn sekinîn. Deste deste
xelk dihatin meydanê û berhev dibûn. Di navbera seetekê de
nêzîkî bîst hezar kes li wir berhev bûn. Bi awakî wisan li derûdora
meydanê hatibûn hev ku te derzî biavêta li erdê nediket.
Ji nişka ve ji aliyê rojavayê meydanê ve xelkê rê vala kir
û melayekî derpêsipî, kale (reşik an çarix) di piyan de û bejindirêj
di riya vekirî re ber bi aliyê kursiyê ve hat û temamê
xelkê bi dîtina wî dest bi çepikan kirin.
Dema ku Şêrko û Pîrût baş li wî melayê nêrîn, dîtin ku ew
kek Bînayî ye û di cî de ji kurdekî ku nêzîkî wan bû pirs kirin:
- Erê keko, Qazî kîjan e? xelkê digot dê îro xeber bide.
Wî mirovî li wan herdu xortan nêrî û zanî ku ji gundan
hatine û ne beled in û ji wan re got:
- Yê xeber dide ew e Qazî.
Dema ku Şêrko û Pîrût ev seh kirin, ketin rewşek nemir û
nejî de û temamê bedena wan di nav xwîdanê de ma û bi çavê
xwe bawer nekirin. Her çendîn kek Bînayî nedizanî Şêrko
û Pîrût li wir in, lê wan ji şerman nekarîn xwe li wir ragirin
û ji dizîka ve ji meydanê dûrketin. Te digot zimanê wan bi-
91
rîne û heta wisan bûn qasekî bi hev re jî xeber nedan. Kek
Bînayî rojekî berî wê ji wan re gotibû ku hinek zûtir werin
ba wî. Rûyê Şêrko û Pîrût nedigirt ku biçin û ji şerman wext
bû dîn bûna. Danê êvarê kek Siwar hat mal û dema ku ew
di wî halî de dîtin ecêbmayî ma û sebebê xemgîniya mêvanên

xwe pirsî:
- Çi li we qewimiye, ji bo çi hûn bi vî awayî xemgîn û melûlin?
Şêrko û Pîrût, hemû serpêhatiya wê rojê jê re neqil kirin û gotin ku rûyê wan nagre biçin li ba kek Bînayî. Lê kek Siwar li ber dilê wan ket û ji wan re got:
- Ne, ne, rabin herin û qet bi ser xwe ve jî neynin. Hûn nizanin kek Bînayî heta Xwedê bixwaze însanekî sade û xalis e û eger hûn neçin dê dilê wî ji we bimîne.
Şêrko û Pîrût nejidil û bi hej-hej rê ketin û dema ku gihîştin hindur, dîtin ku kek Bînayî bi cil û bergên wê rojê ve rûniştiye û kitêbek li ber wî ye û dixwîne. Ew hinekî bêdeng man û gotinek ji devê wan derneket. Pişt re ber bi pêş de çûn û xwestin destê kek Bînayî maçî bikin. Dema ku kek Bînayî ew dîtin ji ber wan ve rabû û nehişt ew destê wî maçî bikin û di cî de zanî ku wan xortan ew naskirine. Ji ber vê, ji bo ku şerma wan birevîne, ji wan re got:
- Dê baş e, we Qaziyê xwe yê çîpilrût dît?
Her çend kek Bînayî ji wan re gotibû rûnin jî, lê ew rûneniştin û destê wan li ser hev sekinîbûn û serê xwe kiribûn ber xwe. Pişt re Pîrût xwe lê negirt û got:
- Qurban, Qaziyê birêz li me bibore. Me heta niha te nas nedikir...
Kek Bînayî hinekî rûyê xwe tirş kir û got:
- Ji kengî ve ye ku ez ji we re bûme birêz Qazî! Kek Bira
91
herhalde te navê min ji bîr kiriye, ez li ba te ne birêz Qazî me, ez kek Bînayî me. Kekên min gelek e ev qet ji bîra we neçe, hekene dê emê rastê astengan bên û biçûktirîn terkexemiya

me dê firset bide dijmin ku karê me yê nehênî bizane.
Ji me re îro hişyarî, ew jî hişyariyeke zanatî ji hemû tiştî pêwîstir e.
Kek Bînayî hinekî bêdeng ma û pişt re bi berken got:
- We wisan dizanî ku şaxên Qazî hene û ew nasibin
însanan? Ne, ne, birayên min, ez jî wek we me û tiştekî min
ji yê we zêde tune, eger ji vir şûn de hûn wek destebirayekî û
hevalekî li min nenêrin dê dilê min ji we bimîne...
Mutewazîtî û gotinên xweş û sade yên kek Bînayî şerma
wan xortan revand, ew rûniştin û kek Bînayî ji wan re dûr û
dirêj behsa dîroka Kurdistanê kir...
Pişt re kek Bînayî berê xwe da wan û got:
- Sibê dê makînek Lorî ber bi aliyê Urmiyê ve biçin, hûn
jî siwarê wê makîneyê bin û vî torbê kitêban bibin bidin
Cangoyê Herkî yê li gundê Sîrme yê navçeya Têrgeverê û bila
belav bike. Lê tivingên xwe negrin ser xwe.
Şêrko û Pîrût, zû ve bi hêvî bûn ku ji aliyê Komeleyê ve, bi
taybetî ji aliyê kek Bînayî ve ji wan re wezîfêyek wiha bê dan
ku xwe pê bidin îspat kirin... Pîrût her çaveriya wê bû ku rojekê
jê re bêjin here filan serokeşîrê welatfiroş bikuje yan tazî
bike û bîne bajêr. An jî here filan fermanderê jendirman bişelîne.
Lê qet hêviya wê nebû ku torbek kaxez bidin pişta wî
û jê re bêjin here wan belav bike. Ji ber vê, gelek nejidil ji ba
kek Bînayî derket û di rê de berê xwe da Şêrko û jê re got:
- Hêêê û hê, xwelî serê me, welleh me tamam kir! Vêca tu
bi Xwedê bikî mirov bi kaxez û perran dikare zora dijmin bibe?
Heyfnîne tu tivinga reş nîşanî dijmin nedî...
93

Şêrko bersîva wî da û jê re got:
- Ew ji me aqiltir in û dibê çi tiştên ew bi feyde bizanin em wisan bikin û kaxêz belavkirin jî karek e, li hemû ciyê tiving nayê bikaranîn...
Şêrko û Pîrût çi ji wan re hatibû gotin pêkanîn û pişt re cardin vegeriyan Sablaxê.
Êdî ew cotexort bûbûn 'ezîzê Komeleyê û çi karên ji wan re dihat spartin ew bi serfirazî pêk dianîn. Kek Bînayî çend caran wî cotexortê bi xwe re bir nav eşîretan, seferên dûr û dirêj û di eynê wextê de hemû rojan seetekê dersê siyasî jî ji wan re digot. Piştî salekê ew herdu xort hînê xwendin û nivîsandinê jî bûn.
Bi kurtî êdî Qulî ne ew Qulî bû. Bi qewlê kek Mamend, nav û dengê mêrxasî, azayî, karzanî û têkoşeriya Pîrûtê pirçîn li seranserê welat belav bû. Pîrût tenê di warekî de qels bû. Ew jî ew bû ku, dost û bîraderên wî jê re Bira digotin û navê xwe yê xweş yê kurdî nedikarî ji kesekî re bêje. Rojekê Pîrût bi çend dost û hevalên xwe ve, ku hemû endamên Komeleyê bûn, rûniştibûn û xwarin dixwarin û hemûyan ji hev re bira bira digotin. Ji nişka ve pişîkekî kir miyew-miyew û ket hindur û dema ku Pîrût pisîk dît wî dest bi ken kir. Ev halê wî li tevan gelek ecêb hat û jê pirsîn: tu ji bo çi dikenî? Pîrût jî ji wan re got:
- Li aliyê me melayek hebû û ji bo ku bi gotina "pişe-pişe" gelek dixeyêdiya, navê wî danîbûn "mele pişe-pişe". Feqiyan roja înan diçûn ratib berhev dikirin û ron, pirinc û mirîşk dianîn û bi awakî xweşik ew dipehtin. Dema ku bi emrê mela li dora sîniyê berhev dibûn û xwarin dixwarin,

gurpe-gurp ji lêva mela yê jorê diket. Feqiyan jî ji tirsa mela nediwêriyan bêjin pişe-pişe û mecbûr diman bi dengekî din
94
pisîkê dûr dixistin. Yekî digot "wehe", yê din digot "heçe" û yê sisiyan jî digot "kis-kis". Lê pisîkê guhê xwe nedida wan gotinan û çavê wî bi çi perçê goştê xweş biketiya direvand. Çend caran ev bi vî awayî diqewime û di dawiyê de êdî sebra feqiyan namîne, rojek dema ku xwarinê dixwin cardin pisîk dikeve hindur û yekê ji wan dibêje: welleh eger mela min bikûje jî ezê bêjim "pişe-pişe". Vêca niha hûn min bikujin û kerî-kerî jî bikin hûn bi kêfa xwe ne, navê min Pîrût e, wî bira birayê bi min ve daneynin...

Pîrût, ji roja Kanîsewzeyê derketibû heta wê demê tu wextê bab, dayîk, xwîşk û birayên wî ji bîra wî neçûbûn û çend mehan carekê bi riya rêbarên nas çay, şekir, pere û pêlav ji mala xwe re dişand û kek Mamend di saya wî de ji destê zulm û zoriya ji heddê xwe derketî ya Qerenî Axa jiyanek nemir-nejî derbaz dikir û her wextê dua'ayên umrekî dirêj ji kurê xwe re dikirin...

Pîrût, çend caran Qerenî Axa tehdît jî kiribû û gotibû ku: "eger rojek jî jiyana min li ser rûyê vê dinyayê bimîne ez ê tolaxwe û babê xwe ji te vekim...". Pîrût çend caran xwestibû ku ji bo pêkanîna karekî Komeleyê wî bi aliyê Seqizê ve bişînin, lê serokên Komeleyê dizanîn ku di şandina Pîrût li wir de tirs heye û li hemû ciyê lê digerin, ev daxwaza wî qebûl nekiribûn.

Qerenî Axa jî ji ber tehdîdên Pîrût di nav tirsek zêde de bû û bi awakî vekirî nediwêriya dijmintiya kek Mamend bike,

lê di bin re û bi riyên cihê cihê re ji bo wêrankirin û perîşankirina mala kek Mamend ji tu xerabiyên necamêriyê paş de
95
nedima...
Di havîna sala 1945'an de, Pîrût ji aliyê Komeleyê ve bi du berpirsiyarên Komeleyê re ji bo karên siyasî ber bi navçeyên Makû, Xoy û Salmasê ve hat şandin. Çend meh bi ser vê seferê re derbaz bûn û di vê navê re Pîrût nekarî alîkariyek ji babê xwe re bişîne. Nehatina alîkariyê ji aliyê Pîrût ve û zerardayînên bi zanetî yên Qerenî Axa bi hasilata ku kek Mamend bi keda milê xwe anîbû ber berhem, rewşa wî malê di wê zivistana giran a sala 1945'an de rastê perîşanî, nexweşî û birçîtiyek gelek xerab kiribû...
Di dawiya sala i944an de êdî Komeleya J. K. siya xwe bi ser seranserê Kurdistanê de berdabû û kar û barên Sablaxê bi awakî eşkere bi destê Komeleyê dihat meşandin. Komele, di nav beşa piraniya civaka rûniştiyên Kurdistanê de ji bo pêşdebirina şoreşê şert û mercên baş pêkanîbû. Êdî dema têkoşîna nehênî xelas bûbû û ew rewş peyda bûbû ku partî eşkere bibe û ji bo daxwaz û armancên civaka gel, yanê ji bo bidestxistina rizgarî, serxwebûnî û muxtariyeta Kurdisatnê dest bide ber xwe.
Di destpêka sala 1945'an de, êdî qefle-qefle kesên çekdar diçûn ba Komîteya Serokatiya Komeleyê û dixwestin wan bişînin melbendên Kurdistanê yên din û wan deran jî rizgar bikin. Qefle-Qefle xortên gundî, eşîretên welatparêz û feqîrên bajaran hatibûn Sablaxê û çaveriya qewîtî û emrê Komeleyê bûn. Li milê din, hatina leşkerên qehreman ên Barzaniyan,

çend zabitên xwenda ên perwerdekirî, têgihiştî û pispor
ên kurdê Iraqê, hê zêdetir tevgera şoreşê bihêztir û firehtir
96
kir û berî hemû tiştî pêwist bû rêxistina partiyê bibe çavkanî
û mamosteyê rêkûpêkkirina tevgerê û handerê şoreşê û ev jî
bi wan hat pêkanîn.
Komeleya J. K. ciyê xwe da Partiya Demokrat a Kurdistanê.
Gava yekem a ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistanê ve
ku hat avêtin, sazkirina hêza pêşmerge ya Kurdistanê bû.
Hêza pêşmerge... wê navê xweş ê kurdî hê zêdetir ruhê
xortên xwîngerm welatparêz ên kurd geş dikir û azayetî,
mêrxwasî û bikêriya wan ew kapang-kapang ber bi jor ve dibir.
Hemû xortan hewil didan ku di riya rizgariya welatê
xwe de bibin pêşmerge û ji hevalên xwe yên din pêştir bikevin.
Pîrût jî yek ji wan xortên pêşmerge bû. Ji wê muddê ku
nehênî bi Komeleyê re kar dikir heta vê çaxê, gelek caran hatibû
ceribandin, di hemû karan de bi başî serketibû, di lêxistina
nîşanê de û pişthespiyê de nav û dengê wî belav bûbû.
Pîrût bi şev û roj mijûlê hînbûna fennên eskerî bû û çend
rojan di bin destê zabitên kurdê Iraqê de wisan lêhat ku, di
fennên eskerî de bêyî ku zanistgeha bilind a eskerî xwendibe
ji gelek eskerên ordiya Şahînşahî şarezatir, tecrubetir û zanatir
be. Berbijorve çûyîna wî rastê wê demê hat ku, êdî zanistgeha
welarparêziyê temam kiribû û ruhiyet, bîr û baweriya
xwe di nav wê zanistgehê de helandibû. Ew jî ji mirov re ji
hemû zanistgehên zanistî binirxtir e û bastirîn dibistana têgihiştina
mirov e. Pîrût gelek bi ser de derbaz nebû kirin zabit
û fermanderiya 40-50 pêşmergeyan dikir û qehremaniya wî

ya yekê jî di dema rizgarkirina Serdeştê de bû. Li ser vê qehremaniya han ji aliyê Pîşewayê Kurdistanê Qazî Mihemmed ve pîrozbahiyek taybetî ji desteya wî re hat kirin.
Ew desteya ku Pîrût fermanderiya wê dikir, ji xelkên cihê cihê yên Kurdistanê pêk hatibûn. Mirov di nav wan de
97
Hewşarî, Sablaxî, Barzanî, Şikakî, Seqizî, Kirmanşahî û yên din didît û herkesê bi devoka aliyê xwe xeber dida û hemûyan jî ji hevûdu fehm dikirin. Çunkê zimanê tevan kurdî bû. Armanc, bîr û baweriya tevan wek hev bû, yanê rizgariya Kurdistanê bû. Bi roj wan pêşmergan perwerdetiyê dikirin, hînên fennên eskerî dibûn û bi şev jî çend seetan hînê xwendin û nivîsandinê dibûn û piştî tev van kirinan jî li hev berhev dibûn henek, tinaz û yarî dikirin.
Şevekê piştî temambûna xwendinê hemû li hev berhev bûbûn û her yekî ji wan behsa serpêhatiya bûyereke xweş dikir û pişt re jî tevan bi hev re ji nîvê dilê xwe dest bi ken dikirin.
Yê Mengûrî got: "Rojekê em li mizgeftê rûniştibûn û mela ji cema'etê re kitêb û Qur'an dixwend û digot: 'dinya li ser pişta gayê ye û ga jî li ser pişta masiyê ye, dema ku masî xwe bileqîne dê dinya xera bibe'. Dema ku min ev gotin ji mela seh kir, min jê re got: melayê birêz, ez bi hersê telaqê xanima Zîna xwe sond dixwim ku bi şer'a Xwedê û pêxember tu fetwa jê re tunebe, ez ji vê du'ayê re amîn nabêjim. Eybe ji te re eyb!"
Ebdulbaqiyê Kelhurî ku ji aliyê Hewşarê ve hatibû û bûbû pêsmerge, gelekî methê xwe dikir û gelekî jî ji xwe razî bû. Vêca berê xwe da hevalên xwe û got: "Ez bi Seyîdê Sefaxaneyê

û Çinara Hewes Xan sond dixwim, ez ê êrîşek wisan bibim
ser wan ku kok û xwîna wan sebaban bimalim...". Kurekî
Kelhurî yê din ku nasê Ebdulbaqî bû û dizanî ku ew gelekî
meuSê xwe dike û zirtan davêje, ji nişka ve hilda û jê re
got: "Ebdulbaqî, ez bi Şalpîr Mihemmed qesem dikim tu
derewa dikî, ka pêşî behsa tirsa xwe ya ji reşahiyê bike". Dema
ku Ebdulbaqî ev seh kir, hinekî sor bû û got: "Sebab, tir
li ku û das li ku, çi eleqa tirê bi das û ya Hemze bi Ebbas ve
98
heye, qey niha ciyê van gotinane". Lê pêşmergeyan dev jê
bernedan û jê re gotin ku gerek e ew ji wan re behsa wê meselê
bike. Ebdulbaqî dest pê kir û got: "Êvarekê qerebînaya
min di berîka min de ye û ez ber bi aliyê Qozluyê ve diçûm.
Di rê de min dît ku reşahiyek ber bi min ve tê û wek
jendirman e. Min di dilê xwe de got: keçelo mala te ne ava,
eger niha ji qerebîna min duman derkeve dê çawan be. Min
pesnê xwe da û da ber zirtan û got: tu çavê min ê rastê yî Ebdulbaqî!
Lê çiqas diçû hê zêdetir reşahiya sebab ber bi min
ve dihat, ziravê min qetiya û di dawiyê de ez bi ser de qêriyam
û min got: reşahî tu bi raya Xwedî bikî tu bêjî ka tu kî
yî? Lê dema ku reşahî hê hinekî din jî nêzîkî min bû, min
dît ku ew kurê keçel ê pînedizê me ye. Min jê re got: ma qey
tu insan î, mala te neava, ma qey te nedikarî tu dengê xwe
bikî?.. ". Ebdulbaqî ev got û ji bo ku hevalên wî yên pêşmerge
jê re nebêjin tirsonek, cardin dest bi meîhê xwe kir û got:
"Ezbenî, sond li canê we be, dema ku em biçin şer, ez ê şeşluleya
xwe ya le'netî wisan biteqînim ku hemû ordiya 'E'lahezretê
Xumayînî ji tirsan zikê wan biteqe...". Kurekî Kirmanşanî

yê ku navê wî Nasirqulî bû, jê re got: "Kek Ebdulbaqî,
tu bi serê Hezne dikî, tu henekan nekî. Birayê min, te
sehkiriye ku dibêjin: 'bi tir û fisan hemam germ nabe! tu
fayda pesindanê tune, eger tu mêr î di meydana ceng û şer
de xwe nîşan bide, bi henekan şer nayê kirin...".
Nasirqulî gelekî bêdeng û melûl bû, çi kesê çavê wî pê biketiya
dizanî ku ew xortê şox û şeng dilê wî tejî gotinin û li
hevalekî digere ku ew jê re vala bike. Wê navê re ku hemû
pêsmerge bi henek û laqirdiyan mijûl bûn û rojên xwe bi
ken û xweşî derbaz dikirin, Nasirqulî her mat û xemgîn bû.
Ne tenê ku ken û henek jê sadir nedibû, belko ji henek û ti-
99
nazên Ebdulbaqiyê Kelhurî jî aciz dibû. Pîrût wek fêrmanderekî
karzan û agah li hemû derdên pêşmergeyên xwe, yên
di dilê Nasirqulî de bûn xwendin û dest avêt sitûyê wî û jê re
got:
Birayê min, tu ji bo çi ewqas dilmayî û melûl î. Kirmanşana
te bi bîra te ketiye û yeqîn tu niha dibêjî: "va Sablax rizgar
bû, çend roj şûn de emê biçin Seqiz û Baneyê jî ji destê
dijmin rizgar bikin. Lê dê Kirmanşan di destê dijmin de bimine...
.
Ne çavê min, mereq neke. Dê dora rizgarkirina Kirmanşan
jî bê. Dewleta azad û serbixwe ya Kurdistanê, navçeya petrolê
û bi hezaran gund û avahiyên pirr bi serwet, wek baxê bê
bulbul û bihara bê gul wisan e. Do haya te lê bû, dema ku
Pîşewa ji pêşmergan re xeber da çi got? Wî got ku: niha ordiya
Ingilîzan li Kirmanşanê ye û em jî xwediyê wê taqetê nîn
in ku bikarin li hemberê dewletek mezin a wek Ingilîstanê

rabin. Lê em nasekinin û emê ji bo azadiya hemû Kurdistanê
têbikoşin. Komara me bûye çirayê ronahiya temamê Kurdistanê.
Ha, haa tu wan pêşmergan dibînî? ew Barzaniyên
birayên me ne û ji Iraqê hatine alîkariya me, bi awakî qehremanî
ruhê xwe di riya Komara Kurdistanê de feda dikin.
Çunkê ew Komar a xwe dizanin... Babê min, bila dilê te
xweş û şa be, qet xwe aciz neke, gelek nakêşe dê tu wek fermanderekî
qehreman ê hêza peşmerge bi xwe bi leşkerê xwe
ve Kirmanşanê rizgar bikî û dê xelkê wê bi çepik û destgulan
bênpêşiyate...
Dema ku Nasirqulî ew gotinên Pîrût ên dawiyê seh kirin,
berken bû û got:
Ev gotinên te mesela karwançî û kerê wî bi bîra min xist,
ku ji kerê xwe re gotiye: "kero nemre bihare, şîva kero qêvar
ioo
e". Babê min, kek Pîrût, niha li Kirmanşanê rewş têkelhev û
aloz e. Tu dizanî, dûrketina ji malê gelekî ne xweş e. Ew Ingilîzên
sebab mala xelkê Kirmanşanê wêran kirine. Çavê xelkê
li riya me ye...".
Dema ku Pîrût bi Nasirqulî re xeber dida, pêşmergeyên
din mijûlê henek û tinazan bûn û Seyîd Ebdullahê Sablaxî,
ku di dema xeberdana xwe de derewên mezin dikirin, çend
pêşmergeyan li dora xwe berhev kiribûn û mesela xwe ya
evîniyê ya di nav qelaxên sergînan a li Indîrqaşê ji wan re digot
û hemû heval dikenandin. Seyîd Ebdullah digot: "Min li
Indîrqaşê hez ji keçkekê dikir. Ew ewqas sipehî bû ku wek
çirayê diteyîsiya. Çavên wê ewqas xweşik bûn ku te digot sitêrka
Suheylê ye. Ciyê hevdîtina me di nav qelaxên sergînan

ên malan de bû. Ez şevekê çûm wî ciyê me û di nav qelaxên sergînan de li hêviya wê bûm, tam wê navê re min dît ku tiştek ber bi aliyê qelaxê ve tê. Dema ku min baş lê nêrî, ez ji we re çi bêjim axayên min, va seyê zerê dirr ê Hacî Birahîm. Ez nizanim wî sebabê bîhna min hildabû û çi, wextî ziravê min biteqe û ez bêdeng li ciyê xwe rûniştim. Min tiştek girt destê xwe û min got, Wellehî eger ew bê min ez ê vê nîvê şilka serê wî bidim. Hinekî tarî bû û min tişta destê xwe de hilgirt û min hinekî lê nêrî, min got erêêê û erê mêrik me tamam kir. Vêca ezbenî seyê zer li ber deriyê qelaxa sergînan rûnişt, ez dikuxim ew direyî, ew dikuxe û ez direyîm û dibêjim ku belko destê min li kunga milê wî bigre...

Tam li vir Pîrût biken got:

- Seyîd Ebdullah te lezzet dît...

Seyîd Ebdullah ku gelek bêzarî xeber dida û dixuya ku wê şevê gelekî tirsiya bû, got:

- Kuro mala te bişewite, di wê demê de lezzet û mezzeta çi

IOI

û tiştê çi, agahê min bi tu tiştê nemabû, wisan li min hatibû ku tiştê min jî raketibû...

Gelek gotinên xweş bi kek Hesoyê Şikakî re jî hebûn. Heso du salan li Urmiyê eskerî kiribû û ji destê zabitên ordiya Şahînşahî gelek qehir û eziyet kêşabû û piştî belavbûna ordiya Urmiyê, tola xwe ji zabitan vekiribû. Vêca Heso ji pêşmergeyên hevalên xwe re qise dikir ku çawan ji destê wan zabitan kêsaye û çawan tola xwe ji wan vekiriye. Heso digot: " ez xulam, ez wextê Hukumeta Riza Şah de li bajarê Urmiyê esker bûm. Zabitê me mirovekî gelek xerab bû û ji pîsaya

xwe pîstir bû. Hemû şevan piştî ku em radiketin, ew dihat û digot: "çavê xwe bel kin!", "simbêlê xwe qît kin!", "milê xwe req kin!", "tivinga xwe saz kin!". Me ji bo 'e'la Hezretê Şahînşahî şer dikir. Ji bo ku xewa min gelek giran bû min nedikarî ez zû bi zû rabim. Hemû caran wî bi zîlle û pehînan li min dixist. Wî sê caran digot: "dê kopek rabe!". Wextê ordiyê banz da wî ji tirsan kincên jinan li xwe kir û banzda gundekî Têrgeverê. Min dizanîbû ew çûye kîjan gundî. Ji ber vê, ez çûm wî gundî û min ew dît û gazî kir: "birêz zabit, te ez nas kirim?". Wî ji min re got: "tu mirovekî qenc î, were rehmê li min bike". Min jê re got: "bi salan te bi pehînan li min xist, niha guhê xwe bide min: "dîqat!, simbêlê xwe qît ke!, çavê xwe bel ke!, zikê xwe bikêşe hindur!, lingê xwe fireh ke!". Dema ku wî zabitî lingê xwe fireh kirin, min li ser hesaba dused caran pehînek li pişta wî xist. Wî kir qaje-qaj û bi zarîn bi ecemî got: "ey way gozim sindî, belim çixtî...".
Şev gelek dereng bû, lê kesekî ji pêşmergan hîsa bêxewî û acizbûnê nedikir. Hemû kêfxweş û şad bûn, dora kilamgotinê hat. Dengekî gelekî xweş li ser Nasirqulî hebû, ji ber ku ew heval jî kêfxweş û biken be Pîrût destê xwe avêt sitûyê wî
101
û jê re got:
- Birayê min, dê ka bi wî dengê xwe yê xweş kilameke aliyê Kirmanşanê ji me re bêje...
Temamê pêşmergên din jî jê daxwaz kirin ku ji wan re kilamekê bêje. Nasirqulî nekarî bêdiliya wan bike û bi wî dengê xwe yê xweş dest bi vê kilama han kir:
Ez Kurdistanî me xwe fars nizanim

Bi zimanê kurdî dertê ji giyana min
Ber bi bihîstinê herdu bi hev re rabin
Gotina min tesîr lrir ji hev cuda bin
Kurdo min çi got te çi seh kir
0 bi gotinên nenasan ji min dûr ketî...
Nasirqulî ne hunermend bû û ne jî xwendewar, van gotinên
pirr bi me'ne ji ber xwe ve çênekiribûn, wî ev di zaroktiya
xwe de di dema gerelawêjî û sitiranên li gundan seh kiribûn.
Di wê demê de ku temamê fikir û xeyala wî li Kirmanşanê
bû, bêyî ku hay lê hebe ew kilam hatibû ser zimanê wî.
Di zivistana xedar û giran a sala 1945'an de, Pîşewa ji bo rizgariya
navçeya Seqizê û Dîwandereyê ji destê ordiya dagîrker
a îranê biryar da ku hêza pêşmerge rê bikeve. Çend caran ji
aliyê Hukumeta Millî ya Kurdistanê ve ji serok û fermanderên
ordiya îranê re hatibû gotin ku bê jer û bê xwînrijî Seqiz
û Dîwandere vala bikin. Lê Hukumeta îranê ev qebûl nekiribû
û bi ser de jî roj bi roj beşên nû yên ordî, çek û cebirxanan
dişand Seqizê û heta gelek çek û cebirxaneyên zêde da-
103
bûn çend axayên welatfiroş ên wek Qerenî Axa yê xelkê Kanîsewzeyê
ku li hemberê hêza pêşmerge şer bike.
Ew emrê Pîşewa ji bo Pîrût û her wiha ji pêşmergeyên ku
ji navçeya Seqizê bûn, mizgîniyek gelek xweş û mezin bû.
Pîrût bi sitandina vî emrî, temamê pêşmergeyên Kanîsewze
û gundên li derûdora wê li dora xwe berhev kirin û bi kêfa
dilê xwe ew rêkxistin.
Pîrût ji wan re digot: "em çawan bigihîjin Kanîsewzeyê, ez
ê berî hemû tişrî biçim û destê babê xwe maçî bikim. Çunkê

min cara yekê navê Komeleyê ji wî seh kir û wî bi du gotinên xwe yên kurt û sade temamê me'neya kûr û hemû milên Komeleyê bi min da fehm kirin. Bi rastî jî ew ne tenê babê min e, belko yekemîn mamosteyê xebata min e jî...".
Pîrût, piştî van gotinan çavek bi ser pêşmergeyan de gerand, dît ku Şêrkoyê bira û dostê wî yê hevraz û nişovan hinekî aciz in. Xwe nêzîkî wî kir û ji bo ku dilê wî xweş bike, jê re got:
- Bira can, bêhna xwe teng neke, Xezala xwîşka min dê bi dîzek dewê sar ve bê pêşiya te, ez ê bi xwe bi destê xwe daweta te bikim û sergovenda wê jî ez ê bi xwe bikêşim...
Vê navê re peşmergeyekî ji Kanîsewzeyê û got:
- Kek Pîrût, min seh kiriye ku Qerenî Axa ji Pîşewa re kaxezek nivîsandiye û jê daxwaz kiriye ku wî qebûl bikin ew bê bikeve bin alaya Komara Kurdistanê, erê gelo ev rast e?
Pîrût bi berken bersîv da û jê re got:
- Ew heramzade wek lêfka hemamê ye, herroj li ser yekî ye, wek nisk pês û paşiya wî kifş nîne. Ne, ne, wek tê gotin nîn e. Niha Qerenî Axa hê zêdetir xwe nêzîkî dewleta Tehranê kiriye û li navçeya Seqizê bûye çov û çomaxê destê Riza Xan. Te seh kiriye, dibêjin: "ker bi hecê nabe hacî". Qerenî
104
Axayê çi demokratê çi!. Eger ew çil cûzî Qur'an jî jiber bike, gereke kesek bawerî bi wî neke...
Beşek ji hêza pêşmergeyê Kurdistanê ku desteya Pîrût di nav rêzên wê de bû, ber bi aliyê Seqizê ve ket rê û ji Bûkan derbaz bû...
Qerenî Axa bi fêrmanderê jendirman, kur û xulamên xwe ve

nêzîkî wê qetpala ku kek Mamend bi şev di şikevta wê de mabû, bûn. Ji nişka ve kêrvoşkek rabû û kurê Qerenî Axa yê mezin ku rista Guleşîn di destê wî de bû berda û bi xwe jî bi bayê bezê ket pê kêrvoşk û taziyê û Xwedê çiqas deng dabûyê diqêriya û digot: "dê Guleşîn, dê babê min qurbana te be, bernede!, dê babê min bernede!..."
Qerenî Axa ku di pişt de dihat û ew gotin seh dikir, tenê serê xwe dihejand...
Ew kêrvoşk ji kîsê wan çû û di nav daristanê de wenda bû. Hê gelek bi ser de neçûbû, yek ji xulaman rêçeke nû dît. Ew û kurê axê li pê ketin û hinek çûn, xulam ji dûr ve dît ku kêrvoşkê xwe di biniya şikevtê de di nav befrê de qelizandiye û bi zorê çav û simbilê wî dixuyên. Ji bo ku kêrvoşk bi ser wan re derbaz nebe pêşî lê birî û dest bi qêrînê kir: "hêy, tu ku de biçî, ji min re xulamê Qerenî Axa dibêjin".
Hê hemû siwar li derûdora kêrvoşkê nehatibûn hev û çaverê bûn ku Qerenî Axa kîsa xwe derbixe û heqê dîtina kêrvoşkê bide û pişt re tajiyê berde. Qerenî nejidil û gelek bi hişyarî kîska xwe ji paxila xwe derxist û di ciyê pêncî tumenan de kaxezek pênc tumen girt destê xwe û dikir ku bide xulêm, dît ku ji aliyê şikevtê ve xwişe-xwişek hat û kêrvoşkê
105
xwe ji ciyê xwe avêt...
Kek Mamend, ku wê şevê heta sibê di şikevtê de mabû, zimanê wî nedileqiya û herdu lingên wî sirbiribûn, tenê perdeyên guhê wî nedirabûn û bi zor û bela jî be hê hinek taqeta wî ya bihîstînê mabû. Dema ku xulamê Qerenî Axa li hemberê şikevtê qêriya, bêyî ku bizane ew dengê kê ye û çi

dibêje, dengê wî wek dengekî ji dûr ku ji binê çalek gelek kûr bê hatibû guhên kek Mamend. Kek Mamend di wê halê de jî hê hêviya jînê ji destê xwe bernedabû û bi bihîstina wî dengê bi zikxuşilandî serê xwe ji şikeftê derxistibû...
Dema ku Qerenî Axa dît kêrvoşk banz da pênc tumenê xwe kir bêrîka xwe û ji kerban ewqas aciz bû ku, te digot pizuta êgir e û dikir qîre qîr û digot:
- Kuro, ew çi xişe-xişe?
Qerenî Axa bi xwe jî hespê xwe da ber rikêfan û nêzîkî şikeftê bû. Dema nêzîk bû, dît ku kelaxê kek Mamend li erdê ye û bi zorê nefesê distîne. Axa hinek din jî aciz û tore bû û ji hespê xwe peya bû û bi pehînan lê wer bû û dest bi dijûnan kir: "hey tolebab, li serê çiyê jî tu dibî asteng li ber kêf û xweşiya min, eger te serê xwe ji wê şikeftê dernexistibûya wê kêrwoşkê banz nedida". Kek Mamend, bi zimanqerimî her tenê karî bi çavekî gelek bi kîn û kerb li Qerenî Axa binêre. Qerenî Axa xwe kerr nekir û her diaxift û digot: "dê bila canê te ji birçiyan derkeve! axira we tevan ji birçiyan mirin e. Kurmanc çiye ku bêje ez li hemberê axa heme, dê bila niha Pîrûtê kurê te bê hawara te!...".
Dema ku fermanderê jendirman zanî ku ew kek Mamendê babê Pîrût e, berken bû û Qerenî Axa ji wê berkenê razîbûna sergord Şimîran ji wî karî derxist û hinekî din jî li kek Mamend xist.
106
Kek Mamend; bi vî awayî li ber çavê Qerenî Axa û fermanderê jendirman nefêsa xwe ya dawiyê da...
Tam wê navê re ji aliyê Kanîsewzeyê ve siwarek bi lez ber

bi Qerenî Axa û hevalên wî ve dihat. Dilê Qerenî Axa bi dîtina wî siwarê bi lez dest bi gurpe-gurpê kir. Siwar yek ji wan xulamên Qerenî Axa bû û dema ku nêzîkî axa bû bi lez got:

- Ezbenî, pêşmerge gihîştin gund û tu kesî li hemberê wan şer nekir. Berê hemû kesî Pîrûtê kurê kek Mamend bi cil û bergên zabitan ve ket nav gund û niha jî li we digere...

Bi bihîstina vê xeberê rengê Qerenî Axa bû wek cewê spî û ji bo ku ber dilê wî bikeve, berê xwe da fermanderê jendirman û xwest bizane ka gelo dikare çi jê re bike. Fermanderê jendirman li ser hespê xwe çik mabû sekinî û deng jê dernediket, te digot kerr e, bi awakî bile-bilî got:

- Lazime em banz bidin, eger em bikevin destê pêşmergan ew ê me bi zindî bigurên...

Berî beyana sibê desteya pêşmergên Pîrût bi hev re bi gotina:

"Ey reqîb her mawe qewmê kurd ziban
Nayşikîn daneyê topê zeman!"

Ser bi kelê ketin û derbazê nav Kanîsewzeyê bûn. Tivingdarên Qerenî Axa ku ji hemû gundiyan pêk hatibûn û di dilê xwe de qasê dinyayê rikê wan ji Qerenî Axa vedibû, di saya melayê gund ê endamekî Partiya Demokrat ê nehênî, ku gelek caran ew têgihandibûn û bi wan dabû fehmkirin; nebe ew şerê birayên xwe bikin û di muqabilê kurdên birayên xwe de navê xerabiyê bi xwe ve deynin, çunkê Qerenî Axa dijmi-

107

nê kurdan e. Vêca ji ber vê, tu kesekî li hemberî wan gulleyek jî neteqandibû.

Pîrût nedizanî ku Qerenî Axa li mala xwe nîne. Ji ber vê,

çend pêşmerge şandin ser riya Seqizê ku rê li ber bigrin û nehêlin
ew banz bide. Grûbeke din ya pêşmergan jî şand mala
Qerenî Axa û ji bo xatirê dilê Şêrko, bi xwe jî berê xwe da
mala xwe. Dema ku Pîrût gihîşt hewşa mala xwe dengê şîn û
girîna xwîşk û birayên wî hat guhê wî û bi hev re digotin:
"Dayê can, em ji birçiyan mirin... ax babê me nehat...".
Pîrût bi bihîstina van dengan temamê dinyayê li ber çavê wî
tarî bû û wek dînan xwe avêt hindur.
Xaltiya Menîcê pêşî kurê xwe nasnekir. Pîrût ku çend sal
berî niha bi tana kiras û derpê çûbû, niha cil û bergê pêşmergeyên
Kurdistanê li xwe kiribû, sitêrkên ser milên wî dibiriqîn
û qet nedima Pîrûtê berê. Zarok û xortên malê gotin
qey ew fermanderê jendirmane ket hindur û tevan dest bi
qêjîniyê kirin. Ew reben û êxsîrên zimangirêdayî çi bikin,
heqê wan hebû. Piştî kuştina Xwocendî û Mîne Axa û bêserûşûyîn
wendabûna Pîrût, çend caran fermanderê jendirman
wext û bêwext avêtibû ser mala wan, li kek Mamend xistibû
û dijûnan lê dabû û jê re gotibû: "kurê te li erdê yan jî li asîmanan
be dibê tu ji me re bînî...".
Ew kesên li mal tenê Xezal kekê xwe naskir û di cî de xwe
li dest û milê wî da. Dema ku hişê xaltiya Menîcê hat serî,
wê kurê xwe têr bihên kir û dest bi qêrînê kir û pişt re got:
- Ez sedeqa serê te bim, min zanî ku tu fermanderê jendirman
î...
Pîrût bi sehkirina van gotinan, zanî ku jendirman kek Mamend
girtine û birine Seqizê. Bi lez pirsî:
- Êêê babê min li ku ye?
108

- Kurê min, mêrik ji do sibê ve çûye nav daristanê ku hinek dar berhev bike û bibe bajêr bifroşe û hinek arvan bistîne, ji wê çaxê ve hê nehatiye, zarok jî ji bo pariyek nan hawarawane...
Êdî Pîrût xwe li mal gelek mijûl nekir û ber bi mala Qerenî Axa ve çû. Ew pêşmergeyên ku Pîrût ew şandibûn mala Qerenî Axa, jê re cewab şandin ku Qerenî Axa bi fermanderê jendirman re ji paşîvan ve çûye nêçîrê.
Pîrût hê ji zaroktiya xwe ve dizanî ku babê wî li kîjan ciyê daristanê daran berhev dike. Bêsekin bi çend pêşmergeyan ve ber bi daristanê ve çû. Piştî lêgerîneke zêde li nav daristanê û qetpala çiyê, nêzîkî şikeftê bûn. Ji nişkave çavê Pîrût li cesedê babê wî yê sirbirî yê req û bêruh ket, beziya ser û himbêz kir û qêriya: "babooo, babo can, babooo!..." Lê tu pêjin ji kek Mamend nehat û Pîrût ji çavên wî yên mirî van gotinan xwend: "Di riya bidestxistina nan de, ez bi mêranî mirim. Lê, min serî li ber nemerdan netewand! Lawê min, merd be û bi mêranî bijî!...".
Pîrût û hevalên wî cenazeyê kek Mamend anîn gund û gelek bi hurmet li qebrîstana pişt malan veşartin...
Du roj piştî vê serpêhatiya han, ew xulamên bi Qerenî Axa re çûbûn vegeriyan Kanîsewzeyê û gotin ku, Qerenî Axa, fermanderê jendirman û zabitên din li Kanîseyîdê cil û bergên jinan li xwe kirine û ber bi Tehranê ve çûne...
DAWÎ
109
Pêşgotina çapa duwemîn
Rehîmê Qazî
Ji welat dûr gelek nexweş e. Dûr ji wî ciyê ku te çavê xwe lê vekiriye,

çerm bi bedena te ve hatiye û zimanê te li wir vebûye. Dûr ji kes û hevalan.
Dûr ji wan kesan ku di dema berfehmiya te de bi te re bûne, te tinaz
û henek bi wan re kiriye, xwe bi wan girtiye. Li ba te wisan bûye ku
dê hûn heta hetayê bi hev re bin, qet ji hevûdu veneqerin; dûrketina ji
wan gelek nexweş, dilkul û giran e. Ew jî dûrbûneke wisan ku bi te ve girêdayî
nebe, tu nekarî ne kurt û ne jî dirêj bikî.
Li gor min, jiyan, livîn û serpêhatiyên dema zaroktiyê, ew jî bi wê
mercê ku te ew jiyan bi awakî ciwan, xweş û dilxweş a tejî ji av, dar,
mêrg, çîmen û baxên kurdewarî de derbaz kiribe, daîma di bîra te de dimîne
û wek perdeyek fîlma sînemayê ber çavê te re derbaz dibe, bi taybetî
dema dûr ji welat û di xerîbiyê de.
Belê, min li avahiya Gwêgecelê ya ser Çemê Cexetû çavê xwe vekiriye
û bi ziman harime, bi ser pepikan ketime, hevrê, dost û hevalên wê dema
min a zarokriyê ya pêxwas, kirasqetayî, derpêpînekirî, serrût, çilmîn û keçel
ên rûniştiyê wî gund bûne.
Dûr ji welat -di dema jiyana min a ne xwes de, di wê demê de ku bi
baştirîn û bi nav û dengrirîn unîversîteya cîhanê de min lêkolîna zanisriyê
didomand û yan bi zimanê biyanî min ders ji xortên gelên cihê cihê
yên cîhanê re dida, di wê demê de ku min di riyatro, pêşangeh û klûban
de li baştirin baletên cîhanê dinihêrî yan min guhê xwe dida operayên
klasîk ên herî bi nav û deng û dîrokî, yan bi guhdana dengê mûsîqeya
Bethoven, Şopen, Çaykovskî, Bax, Bize, Şistakovîç û Hatad bi dilek
xweş diketim nav derya xeyalan, di wê demê de ku ji bo hisyarî, modernkirin

û berhevkirina hêz û enerjiyek nû ya ji bo têkoşînek nû ya bajrir, ez diçûm nav koşkên bilind ên di nav daristan, qeraxên deryan û çiyan û bi nûnerên bi dehan û bi sedan netewe û gelên din re dibûm nas û dost û min hevalên nû peyda dikirin, di wê demê de ku, di konferans û civînên III
zanistî yên cîhanî yên di derheqê dîroka gelan de, min birrek meselên di derheqê tevgera rizgarî-neteweyî ya gelê kurd de gotarên zanistî pêskêşî zana û pisporên welatên cihê dikir, bi kurtî di dema xwe ya xweşiyê de, li derve û ji welat dûr hêvî û daxwazek min hebû ku qet li ber çavê min wenda nedibû û ji dilê min dernediket, gelek caran min didan xuyakirin û min ji wan kesên li ba min bûn re vedikirin. Ez bêdeng dibûm û min digot: "Erê tu dibêjî dê carek din jî çavê min li Gwêgecelê bikeve û li gel Seyîd Hûseyn, Xalindî Ehmed Cûcîlan, 'Enewî Mîrza Xelîl, Hemegîr, Esedullahê Smaîl Babirî, Mihemmedê Mahşeref, Mehmûdê Mîrza Ehmed û yên din bikeve û em ê biçin bin 'Taqedar' û di gola kûr, şîn û xweş de sêbahî bikin an biçin nav dehlên darên çilo û serê li çiyan nêçîrê bilrin? Belê, bêj e, dê carek din ji min re li hev bê ku heta derengê şevê ez
di hucreya feqiyan de rûnim, em gerelewêjî bikin û ji Kerîm Serşîn û Reşîd Zara lava bikin ku bi dengên xwe yên xweşik sitrana 'Heyran' û 'Wergerê Awêzant bim' ji me re bistrên an li mizgeftê û piştê nimêja îşayê bi Hesen Pûrzilexa û Ebdûlkerîmê Nenexan re 'leyîsrika gore' bilîzin?..." Belê ev hemû hevrê û hevalên min ên dema zarokriyê bûn, qet ji ber çavê min wenda nebûn û niha jî dilê min bi wan xweş e. Ji wan, ên ku nemayîne Xwedê wan efÛ bike û yên mayîne jî Xwedê daîma saxî û selametiyê bide wan. Ev tenê hêvî û daxwaz nîn e, ev koncek biçûk ji bo wî ruhê welatparêziyê ye ku wek deryayek bêbinî û bêsînor di dema ji welat dûr dil û mejiyê mirov ji xwe re dikin wasite.

Ez nizanim ji bo çi wiha bû, di ciyê hemû şiîrên farisî û kurdî ku min di zaroktiya xwe de jiber kiribûn, daîma tenê ev şîîra babê min dihat ser zimanê min, min car caran bêyî ez hay lê bim bi dengekî bilind ji ber xwe ve digot:

Sersewz e Baxê Arezû, nêzîk e bête ber
Mezrayê humîdî tînuw e, wextê şeva wê ye

Qet nabe mirov bêhêvî û dîlsar be. Ez nemirim û hêviya min bid bû. Ez vegeriyam welat. Ez çûm Gwêgecelê. Lê mixabin "Taqedar" û "Baxê Arezû" nemabûn û di bin ava bendê de mabûn. Hemû bîranên min ên dema zarokriya min careke din ji nû de harin ber çavê min. Çavê min

ronî û dilê min geş bû. Eger ez bêjim temenê min nûjen bû û ez harim ser dewra xwe ya berê, lê bi bîr û bawer, bi kirin û bi ruhekî nû ve min qet derew nekiriye. Gelek mixabin, piştî 33 salan, ku temenek e, cardin ez dibînim ku mezrayê hêviya welatê min hê tênî ye û wextê şevava wî bi temamî hariye û bi başî dibê av ser bigre. Va min jî wek hemû gelê xwe zendên xwe rapêçan û coyan jê re xweş dikim ku têr û tesel av vexwe ku, hemû wextê hêjîn bimîne, dir û deviyan ji nav bijêrim û wê asêv bikim ku ava bimîne û sal bi sal dahatek zêderir û baştir jê bê wergirrin.

Ruhê welatparêzî, baweriya bi wê ku ji nû de çavê te li welat û li netewe dikeve, hêvî û çaveriya welat û netewe bi te, ruhiyet, hal û tama mirovragirrinê

te naçar dike ji bo paşvenemayîna ji qefîleya têkojerên gel û qerzdarnebûna li hemberê neteweyê xwe û xizmetekê bikî û erkê ser milê

xwe yê netewayetî cîbicî bikî. Di muddetê ji welat dûr de, ez nivîsandina serpêhatiya PÊŞMERGEyê li hemberê welat û neteweyê xwe xizmeteke xwe ya biçûk dizanim, dibê ez bêjim ku ev yekemîn roman e ku min bi

kurdî nivîsandiye.
Nêzîkî 25 sal berî niha, min di kovareke kurdî de serpêhatiyek kurt ji rûpelek borî xwend, ku di derheqê jiyana tehl, nexweş û belengaz a mala kurdekî feqîr û reben de haribû nivîsandin. Vê serpêhariya kurt perdeya mezin û bêsînor a jiyana xemgîn û hejar a gelê min anî ber çavê min û ji ber vê, bû çavkaniya hêz û îlham ji nivîsandina vê romana han re û min destpêk jî her bi naveroka wê serpêhariyê dest pê kir.
Bêjeya "pêsmerge" diyarî û bîranîneke binirx, delal û birêz e ku ji yekemîn komara netewî û xwedmuxtarî ya Kurdistanê ji me re maye.
Dîrina bêjeya pêşmerge bi serê xwe destanek e. Di dema Komara Xwedmuxtarî ya Kurdistanê de, pêşewa Qazî Mihemmed ku girîngiyek gelek zêde dida ziman û edeba kurdî, xwest di ciyê bêjeyên serbaz, esker, nîzamî û fedayî de bêjeyek kurdî ya xweş peyda bike ku di ciyê wan de bê bikar anîn. Vêca ji ber vê, grûbek ji nivîskar, hunermend û pisporên kurd ji bo vê armancê civînekûê çêdikin û çend seetan gotûbêjê li ser vê mijarê dikin, lê nagihîjîn netîceyek. Kurdekî kal, nexwendî û dinyadîtî ku di wê civînê de xizmeta wan kesan dike, nan û çay ji wan re tedarik dike, dibîne ku hemû kûr kûr difikirin û kerine nav deryaya xeyalan, ji nişkave hildide û ji wan re dibêje: "erê hûn ji bo çi xwe ewqas beleheq
113
aciz dilrin, bab û bapîrên me ji mirovên mêrxwas û kêrhatî re pêşmerge digorin, hûn jî eynê navê bikar bînin."
Vêca bi rastî jî bi sehkirine bêjeya pêşmerge, kurdekî serînetewandî, mêrxwas, nerirs û bikêr, kurdekî welarparêz, rizgarîxwaz û demokrat, kurdekî li hemû ciyê naskirî tê ber çavê mirov. Bi sehkirina bêjeya pêşmerge
bi dehan bi sedan ew lawên kurd ên bêtirs tên ber çavê me ku di

sefên xebat û têkoşînê de ji bo rizgarî û serxwebûnê bi qehremaniyek bêemsal
jiyana xwe feda kirine, heta nefesa xwe ya dawiyê jiyan û wefadariya xwe di nav sefen pêşmergayetiyê de ragirrine. Ji riya xwe şas nebûne û di dîroka neteweyê xwe de destanên qehremaniyê hûnandine. Bêjeya pêşmerge, dêmen û rûyê wan mirovên binirx û birêz radixe ber çavê me ku, bi mêranî, karzanî û xemxwariyek taybetî ji bo xizmeta gel û welatê xwe zend û baskên xwe rapêçan, Partiya Demokrat a Kurdisranê damezrandin
û têkoşîna gelê xwe di riyek durust, baş, bifêyde û li gor pêwistiyên dema xwe gihandin serkevtinê, Kurdistan bi cîhanê dan nasîn û dan qebûl kirin ku, kurd xwediyê hêz, îrade û karzanînek wisan e ku ji hemû kesî baştir dikare kar û barên welatê xwe bigerîne û li ser hukum bike.
Ew kesê wek ku xebatkarekî zana, têgihiştî û dûrbîn dibistana bi nav û deng, muhkem û dadgeha xebat û têkoşînê bi pêşveçûna gelê kurd ve damezrand,
dost û dijminê gelê kurd da nasîn, tovê biratî, dostayetî, yekîtî
û hevkariya gelên Iranê reşand, ew kesê wek pêşmergeyê hejmara yekê bi
tawanê rizgarîxwazî û welatparêziyê bi serbilindî şerbeta şehadetê tam kir: pêşmergeyê hejmara yekê, serokkomarê Kurdistanê Pîşewayê nemir Qazî Mihemmed bû.
Di vê romanê de nivîskar têkoşiye ku temamê sirûşt û taybetmendiyên pêşmerge, di xebat, têgihiştin û awayê xebata pêjmergeyekî sade yê wek Pîrût û Şêrko ve bîne ziman. Vêca ez heta çi dereceyê di vî karê de serketime,
ew bi teqdîr û bîr û baweriya xwendevanên birêz ve girêdayî ye.
Romana PÊŞMERGE, cara yekê di sala 1959 'an de li bajarê Êrîvanê,

di sala 1961'ê de li Bexdayê bi kurdî û di sala 1963'an de li Bakûyê bi azerî hariye weşandin. Li Kurdistana Iraqê ji aliyê xwendevanên kurd ve, bi taybetî ji aliyê edebiyatnas, pisporên edeb, hunermend û nivîskarên kurd ve pêşwaziyek baş lê hatiye kirin û di gelek rojname û kovarên kurdî de li ser nivîs harine weşandin, meth û rexne li ser harine kirin. Mixabin, şert
114
û merc û helwêstên wê demê yên îranê, yanê desthilat û hukumera xwînavî
ya bereya Pehlewî û kirinên dirindeyî yên SAVAK, mecal nedan ku PÊŞMERGE li Kurdistana îranê belav bibe. Piştî ku ez vegeriyam welêt, gelek nas û dostên min, bi taybetî hejmarek hunermend û nivîskarên kurd, bi ser tevan de jî fexr û şanaziya neteweyê min, gula serkopa îro yê edebiyata me, mamosteyê birêz, hêja, hunerê netewayeri û civakî yê Kurdistanê
Hêmin, ji min daxwaz kir ku ez romana Pêşmerge ji nû de biweşînim. Belê ez niha daxwaza ezîzên xwe bicî rirum.
Dem û riya îro ya Kurdistana îranê li gel wê serdema ku romana Pêşmerge hatiye nivîsandin, di hemû waran de, bi tayberi di warê siyasî û civakî de ferq û cihêtiyeke wê ya mezin heye. Hîs û têgihişrina piraniya
gel, awa û tebîetê xebat û têkosînê guheriye û ber bi pês de çûye. Di hemû
waran de ferqa pêşmergeyê îro û pêsmergeyê wê demê heye. Karzanî, netirsî û azayetiya her pêşmergeyelrî wê rojê bi serê xwe roman û destanek
e. Pêşmergeyê serînetewandî yê gelê kurd, wê çaxê li rexê tevgera demokratîk
û netewayetî ya dijî emperyalîzmê ya gelê kurd û temamên gelên îranê rawesta. Tu firset neda destê wan û qehremaniyên bêemsal dan

nîşan. Di wê xebata muqeddes de hejmarek pêsmergeyên serînetewandî şehîd bûn. Çapa diduyan a Pêşmerge wek qedirzanî û sipasiyek ji dil e ji bo bîranîn û xariratên jibîrneçûyî yên wan şehîdên nemir ên gelê me.
Koska edeba kurdî gelek bilind û rengareng e. Kok û bingehek wê ya kûr û xurt heye. Bi tayberi di warê şiîr û metelokan de. Lê mixabin, edeba me di warê romanê de jar e û ew jî ji ber vê ye ku, şert û mercên hukumetên
dîktator û kevneperest firset û mecal ji nivîskarên me re nehişrine ku xwe bilepitînin. Eger romana Pêşmerge bikare di koşka edebiyata kurdî de wek kevirekî ciyê xwe bigre û xwendevanên birêz nirxekî bidinê, ew dê bibe xelatek gelekî bi qîmet û bas ji bo nivîskaran.
Ez sipasên xwe pêşkêjî we dikim.
Mehabad 1980
"5
Pêşgotin
Izzeddîn Mistefa Resûl
Pêşmerge, çîrokek dirêj e, diçe dikeve nav wî baxê gulên bêhnxwes ên ku di baxçeyê edebiyata kurdî de vedane, yan jî desranek taze ye bi kinceî nû yê huner ve, awakî nû ya romannivîsiya bi çend qehreman a mêrxasî û dilêriya gelê kurde dide xuyakirin. Ew bi dowanzdeh siwarên Merîwanê, Kela Dimdimê, Xanzade, Şerîf Hemewend û Mehmûd Axayê Şîwekelî re di nivîsa romanê de ciyê xwe di xaneya nivîsxaneyê de digre û ev jî serdema bexriyarî û serbixweriya neteweyê kurd dide nîşan. Di muddetê xewa xweş ya Komara Kurdistanê ya Demokratîk, bi yadê pirr hêja ya dema paytextiya Mehabadê bi xwîna sor a geş a şehîdên kurd, rengê kesk a axa pak a Kurdistanê û serpêhatiya dilê bêtem ê gelê kurd ê aşitîxwaz, birayetî û azadîxwaz, bi van sê rengên sipehî yê alaya delal a Kurdistana Demokratîk ku bi ser erda mîhrîban û axa dilêran û çavkaniya

qehremanan, bi ser Mukriyan de daçikandiye, bi wî rengê xweşik bi zebra gula genim û bi xameya nav alayê destaneke din afirandiye.
Ez li vir naxwazim behsa nivîskarê Pêşmergeyê bikim, wek birayê şehîdê mêrxas Seyfî Qazî û kurmamê şanazî yê nemir ê gelê kurd şehîd Qazî Mihemmed, an wek xwendevanekî kurd ku hiş û bîra kurdayetiyê di bîra nû ya di axa Sovyetê de perwerde kiriye û niha neferekî rewşenbîr ê bi pirrbawer e di meydana xebata gelê me yê mêrxwas de, ez dikarim vê bêjim
ku, xwediyê Pêşmergeyê di çiyayên Kurdistanê de yekem nefesa şîmal a rewan a wî welatê mêriye û destpêka zaroktî û xortîniya xwe li gundên Mukriyan derbaz kiriye, bi vî awayî şarezayê gelek koncên jiyana civalrî yên gundiyên welatê xwe bûye, di xortaniya xwe de bi çavê xwe rojên jibîrneçûyî yên Kurdistanê li Mehabad dîriye. Têr li alaya muqedes a kurd nêriye. Pişt re hariye Sovyetê û bi xwendewariya nû ya giyan û behra jiyana nû û berhemên nivîskarên li wir tesîreke ejkere ser zanîn û awayê nivîsa wî kiriye, ji ber vê, Pêşmerge tebeqa herî jor a riya rast a ber bi pêşdeçûna edebiyata kurdî girtiye ku dibê bi bingehekî qahîm a serwe-
116
ta neteweyê me ya kevin ve bê qahîm lririn û dîwar û rûkaşên wê bi kevir û nexsên xumalî yên têkel ên li gor hunera xelkê ya bilind bên vehûnandin,
bi awakî wisan ku ji wan milên pêşkevri yên gelên din îstîfade bike,
lê tam bi awayê kurdayeri û ber bi pêşveçûna taybetî ya edebiyata kurdî bi xwe tê de be.
Bi qasî ez dizanim, piraniya wan kesên hêja yên Pêşmerge dixwînin di vê nêrînê de bi me re ne û pişri xwendinê jî dibînin ku, xwediyê Pêjmergeyê
bingehê wê li ser gelekî xîmek kevin a desrana me ya kevin daniye,

wek em dibînin ew rola daye wê pîrejinê û xapandina Mirût ji aliyê wê ve, ew karekter in ku me ji çîrokên di nav xelkê de tên gorin seh kirine, yan ew sriran û kilamên di nav folklora kurdî de hene û di Pêşmergeyê de cî girtine, ew dêmenên taze yên ji beytên kevin ên kurdî ne. Bi awakî baş di ciyê wan de bikaranîna pendên pêşiyan xal û riyeke danevejîna nivîsa
me ya klasîk û jê re dayîna rengekî taze ye.
Vêca ew tê dikeve nav wê dîwanxaneyê, ku bi awakî sade ya kurdî kincê "Powîst, çîroka bûyera Rusî" lêkirî, yan em bêjin li ser awayê hinek çîroknivîsên
ereban ên destpêka vê sedsala han, bûyerên Mahabadê di qalibê romanê de û gelek riştên dîrold tê de bicî dike û bi awayê serîta sînemayê radixê ber çavê me ku, ew kesên agahdarê wê demê nebin mimkun
e tenê di çarçeveya xeyala nivîskar de fehm bikin. Xwediyê Pêsmergeyê, bi cil û bergekî sipehî wek nivîskarên îraetkerê rasteqîniya sosyalîzmê wêneyekî
radixe ber çav, wêneya jiyana corkarên Kurdistanê, peywendiyên navbera gundî û derebegên xayîn, dijminariya derebgên nûker bi gelê kurd û kurdayeriyê re, hewlên wan ji bo fetisandina komara sava û nazik. Di wê wextê de bi çend komek dêmenan ve ku wek li gel Gogol û Tolstoy be, yan wek li gel Maksim Gorlri be di romana Dayîk de. Diyar e mêrxasî û sirûnetewandina Pîrûtê pêsmerge, kerb û kîna kek Mamend di ciwaniya xwe de, baweriya serkevtinê di dilê tevan de bi rînî dike û dema ku komar ji holê rê rakirin, Qaziyê nemir û hevalên wî rên îdam kirin û ew bûyerên xwînavî yên li Mahabadê qewimîn, rûpelên kirinên emperyalîzmê
û nûkerên wê hê zêderir reş û tarî kirin. Di wê demê de em dibêjin, nîşandana axatî bi cil û bergên jinan û banzdana wan ber bi aliyê Şah

ve, dimîne hawara dayîka Bawil ku polîsên Qeyser dest kiribûn binî û şoreşa sala I905an tefandibûn, lê ev hawar hebû û digotin: "emê her ser-
"7
bikevin", ev serkevtin û helarina dijmin û nepakan bû. Bêguman
1905 'an bi xwe re Oktobrê anî û banzdana axayên xayîn ên kurd jî di dema
şikandina alaya me ya muqeddes de bû.
Ev axaftinek ji serpêhatiya Pêşmerge ye. Bila ev jî jibîr neçe ku nivîskar nimûneyek rasteqînî ya awayê têkoşîna nehênî ya şoreşgerî ya Komeleya Jiyanneweyê Kurd (J. K.) radixe ber çavan ku ew û hinek komeleyên kurdan ên berê wê, di têkoşînê de xwediyê serbilindî û dahênerî yên taybetî
ne. Ev jî di dema endametiya Pîrût û Şêrko ya di komeleyê de, ku Qaziyê şehîd dibînin derdikeve. Ev jî dibê di bîr de be ku, li gel wê jî Pêsmerge çend rûpelên xweşik ên sade yên nivîsa kurdî ye û bi raybetî ku bi devoka Mûkriyan hatiye nivîsandin, ew devoka ku li gor baweriya min xwejtirîn û pakrirîn awayê nivîsandina kurdî ye.
Moskova, 1960
118
Balkêşanek
Hesen Qizilcî
Zimanê kurdî jî wek zimanên din bi neteweyê kurd re peyda bûye û di seranserê temenê vî millet de wasiteya rêgihişrinî û rêgihandinî bûye, pêwisriyên gelê kurd pêk aniye. Xwediyê qanûn, desrûr û xezîneyek dewlemend a bêje û gotinan e. Li ber hemû bûyerên dîrokê xwe ragirriye, kariye xwe rizgar bike û bimîne.
Lê, eger hûn rasriyê bixwazin û em xwe nexapînin, di warê edeb de, bi rayberî di beja romanê de feqîr û kêmzexîre ye. Ev jî zêdetir ji ber vê ye

ku, li hinek perçeyên Kurdisranê bi daxwaza helandinê mecal jê re nehatiye
dan. Eşkere ye ku eger mecal jê re biharaya dan dê wî jî beşa xwe berhev bikira.
Lê, hinek kesên dilsoz hene, bi çi awayî be nereweyê xwe jibîr nekirine û kesp û karek jê re kirine. Yek ji van kesan Rehîmê Qazî ye ku romana Pêşmerge nivîsandiye.
Kek Rehîmê Qazî, kurê Seyfulquzzar e, ku wî hemû wexrê bi şiîrên rer û rêrav kurd bi bîra xwe aniye, biraziyê Mîrza Ferrah e ku ew di soreşa giştî ya îranê de ji bo hilweşandina hukumeta dîkraror û damezrandina meşruriyetê têkojiye. Demeke dirêj di zîndanê de maye û di zîndana Tehranê de her wext welatê wî di bîra wî de bûye û di vî warî de wiha goriye:
"Xwezî min bizaniya ku ez kengî ji Tehranê rizgar dibim
Gora min kolana yara min e yan Rey dibe gora min."
Ew birayê heme Huseyîn Xan ê biraziyê Seyfî Qazî ye ku xwe fedayê Kurdisranê kir. Kurmamê Qazî Mihemmed ê serokê Komara Mahabadê ku wek rojê di asîmana azadîxwazî ya Kurdisranê dibiriqe. Vêca ev kek Rehîmê han, riya kes, nas û xanedana xwe girriye û mejiyê xwe ji bo mil-
119
lerê xwe êsandiye û yek ji wan xemxwarê romana Pêşmerge ye.
Ev romana han bi qelemek rewan û awayek sêrîn nivîsandiye û rewşa jiyana kurdên îranê daye xuyakirin, rewşa derebeg û gundiyan, zor û zordariya mîrî û pişrivaniya şoresa Mahabadê ya ji aliyê hemû eşîrer û çînên
Kurdisrana îranê ve radixe ber çav û wek eynik wê bi heleqa dîroka Kurdisranê ve girê dide. wek hatiye gotin; "hera libê wê neyê ram kirin, mirov nizane ka çî ye", heta ew neyê xwendin, mirov sipehîrî, xweşî û

berziya wê ya edebî nizane. Edî pêwisr nake em li vir îzah bikin û rayêxin ber çav. Tu bi xwe bixwîne û ji ram û nûtiya wê ram bisrîne.
Bi rastî ev rişteld girîng e di koşka edeba kurdî de û xizmeteke bi qîmet e ji bo ziman û dîroka neteweyê me. Ez hêvîdar im gelek tiştên wiha bên afirandin û zimanê me bi desr û qelema edîbên birêz dewlemend be û di nav zimanan de ciyê xwe bigre. Bi rayberî ku niha dinya biçûk bûye, miller nêzîkî hevûdu bûne û rewşa aborî ya dinyayê bi bez pêşde diçe ku ev jî gelek resîr ser ziman dike. Çi millerê sisrî û tiralî bike dê zimanê wî lê bibe asreng.
Êdî bi hêviya desr û qelema edîbên dilsoz.
Bexdadiç6o
IiO
WEŞANÊNNÛDEMÊ
i- BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ Celadet Alî Bcdir-Xan / Gramer (1993)
2- DÊ 0 DEMARÎ Egîdê Xudo / Roman (1995) ni rûpel
3- KESKESORNÛredîn Zaza / Çîrok (1995) 58 rûpel
4- DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKEJINAN Rohat / Lêkolîn (1993) 153 rûpel
5- HEZ 0 BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Ceribandin (1993) 103 rûpel
6- MÎRZA MEHEMED Medenî Ferho / Roman (1995) 107 rûpel
7- MILKÊ EVlNÊ Rojen Barnas / Şiîr (1995) 81 rûpel
8-ZAROKAŞEVÊJack London Wergen Mustafa Aydogan / Çîrok (1995) 81 rûpel
9- BIYANÎ Albert Camus Wergen Fawaz Husên / Roman (1995) 108 rûpel
10- MÎRZAYÊ BIÇÛKA. de Saint-Exupêry Werger: Fawaz Husên / Çîrok (1995) 99 rûpel
11- GOTIN Yasar Kaya / Ceribandin (1996) 115 rûpel

11- ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ . . . Xelîl Duhokî (1995) 104 rûpel
13- ŞEVEN SPÎ Dostoyevskî Wergen Firat Cewerî / Roman (1993) 80 rûpel
14- MIŞK0 MIROV John Steinbeck Werger Firat Cewerî / Roman (1993) 126 rûpel
15- BEXÇEYÊVÎŞNE Çexov Werger Firat Cewerî / Piyes (1995) 91 rûpel
16- LI BENDA GODOT Samuel Beckett Werger Firat Cewerî / Piyes (1995) 112 rûpel
17- GOTINEN NAVDARANAmadekar: Firat Cewerî / Aforîsma (1995) 106 rûpel
18- GIRTÎ Firat Cewerî / Çîrok (1996) 174 rûpel
19- KEVOKASPÎ Firat Cewerî / Çîrok (1996) 60 rûpel
20- KULTUR, HUNERÛ EDEBIYAT F. Cewerî/ Ceribandin, hevpeyvîn (1996) 423 rûpel
21- XEZAL Sîma Semend / Çîrok (1996) 71 rûpel
22- EVİNA REBEN Derwêş M. Ferho / Şiîr (1996) 80 rûpel
23- BANGA HAWARE Medenî Ferho / Şiîr (1996) 95 rûpcl
24- KULTUR 0 RAMAN Şerefxan Cizîrî / Ceribandin (1996) 150 rûpel
25- KURÊ ZINARÊSERBILIND Sidqî Hirorî/ Roman (1996) 156 rûpel
26- ŞIÎRÊN BIJARTE Mayakovskî Wergen Silleyman Demir Şiîr (1996) 132 rûpel
27-PÊLENBÊRÎKIRINÊMustafaAydogan (1997) 171 rûpel
28- ŞEREFAWENDABUYÎ YA KATHARINA BLUM
Heinrich Böll Wergen Şahînê Bekirê Soreklî / Roman (1997) 139 rûpel
29- HINGÊ Rojen Bamas / Çîrok (1997) 83 rûpel
30 KEÇA KURD ZENGÊ Cemsîd Bender / Çîrok (1997)
31- PEŞMERGE Rehîmê Qazî/ Roman (1997)
32- SORÊ GULÊ Suleyman Demir / Roman (1997)
Dr. Rehîmê Qazî dı sala 192s'an de II Rohelaıê

Kurdısıanê, ıı gundê GwÎgcelıyê haııye
dınyayê û dı sala 1991'ê de ıı Bakuyê wefaı kırıye
Ew JI malbaıeke navdar e û navê malbaıa wî dı
dîroka wel êı de cıhekî gırîng dıgıre Dıgel lêkoşerÎ
û xebata xwe ya sıyasî, Rehîmê Qazî perçeyê welatê
xwe JI romanê JÎ bêpar nehışııye Ev romana ku
wî dı saia 19s8'an de nıvîsandıye, têkoşîn û xebata
sıyasî û civakî ya serdema Cumhûrıyeta Mehabadê
radıxe ber çavan,)Iyana pêşmergctÎ ya wê demê,
zılm û zordestıya dagırkerên welêı, tadeyî û
bındestıya hundurîn, bı awayekî sade û zelal dıgıhîne
me
Em hêvîdar ın hûn ê vê romana ku JI alıyê Zıya
Avcı ve adepteyÎ kurmancî bûye bı kêfxweşÎ bıxwÎnın
NÛDEM
**

REŞ Û SPÎ

www.nefel.com
info@nefel.com
NEFEL

Reş û spî
1
REŞ Û SPÎ

2

Reş û spî

IBRAHÎM SEYDO AYDOGAN
NEFEL
Stockholm
2002
www.nefel.com
info@nefel.com
3
REŞ Û SPÎ

Ibrahîm Seydo Aydogan: Reş û spî
Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden
www.nefel.com
info@nefel.com
© Ibrahîm Seydo Aydogan û Nefel
Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-973195-3-8
Çapa kevin: Doz
Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan
Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.
Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.
4

Nêverok

Beş I, Ba 7
1. Carinan mirov welatê xwe jî terk dike… 7
2. Bajarekî nû, jiyaneke cida… 9
3. Şevbihêrk… 14
4. Xewnên derketîyan naşibin yên tu kesî 17
5. Hertiştî bi kuştinekê dest pê kir… 22
6. Xewn giş dibin kabûs… 27
7. Têkçûyin li navê mirov napirse… 40
8. Kabûs û xewn tev li hev dibin… 45
9. Leyla Xanim, Binevş, Mîtanî, Serdar, Meryem, Mehabad… 48
10. Mirov dixwaze hezkiriyeke wî hebe… 52
11. Her evînek bi janekê ye… 56
12. Gava yek têk diçe, jiyan lê diherime… 60
13. Jiyana hemû kesên têkçûyî dişibe hevdu… 63
14. Ez tu me, tu jî ez… 65

15. Bûkên nû û yên berê... 70
16. Û jan jî kedî dibin... 74
17. Ez ji te hez dikim, Gulcan... 81
18. Zayin... 85
Beş II, Ez ne ez im êdî 91
1. Hespê har... 91
2. Di xelasbûna her evînê de, dîroknivîs pênûsên xwe dişikînin... 100
3. Nefîkiriyê dinyaya xwe... 105
4. Kîjan...? 110
5. Tifaq... 115
6. Bes tu bixwazî... 122
5
REŞ Û SPÎ

Beş III, û şeytan vegeriya 131
1. Bajarê bêşeytan 131
2. Ev lawik kî ye...? 133

3. Dilo rebeno, lo dilo... 141
4. Şop... 148
5. Sond... heta mirinê... çi bibe jî... 152
6. Here ji vira... 160
7. Piştî ewqas salan dîsa... 168
8. Bes şopek an jî işaretek... 175
9. Min ji vira bibe Gulcan, min bernede... 179
6

Beş I, Ba...

1. Carinan mirov welatê xwe jî terk dike…

Belê, min ew dîtin; diçûn...

Biryar ji berê de hatibû dayin. Wan ê çavên xwe bigirtana û bidaya ser rê. Ew ê biçûna... Ji cîran û hin nasên wan pê ve, tu kesî pê nizanîbû, bê ka ew ê bi kû de biçûna. Ji xwe, ev tişt ji bo wan ewqasî ne girîng bû jî. Piştî ko mirov nema dikare li warê xwe bisitire… Piştî ko mirov berê xwe dide hin warên xerîb û diçe… Wek dara ko mirov bixwaze rehê wê ji erdê qut bike. Êdî veşêrin, ji çi re dibû; eşkere bikin, ji çi re dibû... Lê tevî vê jî ew ê bi dizî biçûna. Wan nedixwast kes bi wan bihise û bibêje »biniherin, va ew jî çûn...«

Wan berî wê bi çend rojan, ji bo çûyinê dest bi amadekirina xwe kiribû. Lawikê malê yê mezin, ji bo peydakirina xaniyekî, hefteyeke berê di

pêşiya wan de çûbû. Û niha ji bo ew jî bi rê ve bikevin û werin, xeber şandibû.
Alavên xwe ji êvar de dabûn ser hevdu. Ji derveyî alavên ferz, zêde tişt bi xwe re nedibirin: Du sê bedil livîn, hin firax û hin kinc mincên xwe... Alavên xwe yên mayî jî li dost û cîranên xwe belav kiribûn. Ne bi dilê cîranên wan bû. Bi mirina wan bû belkî. Lê ew jî neçar bûn. Wan nikarîbû ew alav negirtana. Ji ber ko wan jî dixwast qet nebe, bi vî awayî alîkariyê bi wan bikin. Ji ber vê yekê jî ji bo ko zû bi zû wan bi rê ve bikin, niha serên xwe bi tiştên weha nediêşandin. Ew ê bi dû re lê hay bibûna û her gava ko çav li wan alavan biketana, ew ê di ber xwe de, bi dizîka bi-giriyana.
Her tiştên xwe yên ko dê li wan bibûna bargiranî, yek bi yek ji dest
7
REŞ Û SPÎ

derxistibûn. Lê her ko tiştek dida hinan, weke zarokekî xwe têxin gorê, li ber ketibûn. Bi tenê, bavê wî ji nav alavan rahiştibû teyba xwe û çend kasetan... Heta ko bi xwe kevin nebûya û xera nebûya jî wî ê ew teyb û ew
kaset ji xwe bi dûr nexistana. Wî ê ew ji xwe re bikirana heval û hogir. Heval û hogirên xwe yên xerîbiyê. Li wan deveran, ji wan pê ve, ji xwe re ne tu dost peyda dikir, ne jî tu heval. Her ko bêriya warê xwe bikiraya, dê têketaya odeka xwe, derî li ser xwe bigirtaya, kasetek jî daniya ser û serê xwe li ber bihejanda û têra xwe bigiriya.
Çûyin ne bi dilê yekî jî ji wan bû. Ji qehran tu nemabû bifetisiyana. Lê difikirîn û nedifikirîn, tu rêyên din peyda nedikirin. Roj li cihekî teng li wan çûbû ava. Tu tişt ji destê wan nedihat. Tam sal û nîvekê di ber xwe de dabû. Êdî tu kesî ji wan nema karîbû debar bikiraya. Ne taqet û ne jî

îmkanên ko bikaribe wan li welêt bigire, mabûn. Ji bo ko kes wan nebîne û ji bo ko kes nebêje »belê min ew dîtin... diçûn...« neçûbûn termînalê jî. Li ber xwe diketin, fedî dikirin.
Mekîne di berbangê de li ber derî sekinîbû. Çend cîranên wan yên nêzîk jî hatibûn ber mekîneyê, da ko wan bi rê ve bikin. Lê diya wî Leyla Xanim nehiştibû ko ew li benda saeta çûyinê bimînin. Ji bo ko di pey wan re neniherin, hema zû bi zû, ji bo ko li çavên wan nenere û hêsirên wê neyên dîtin serê wê di ber de, xatir ji wan xwastibû û ew şandibûn malên wan. Lê pîrekên ko bi zora diya wî çûbûn malên xwe, dîsa jî xwe xistibû paş perdeyan û heta ko mekîne ji çavan bi dûr ketibû jî bi dizî di pey wan re niherîbû. Gava mekîne êdî hew xuya bûbû, hêsirên xwe yên ko li dû hev diherikîn, bi qiraxên leçekên xwe paqij kiribûn. Wan jî dizanîbû, her cara ko ew di ber deriyê wan re derbas bibin, Leyla Xanima weke her car li ser kevirekî rûniştî dê bihata bîra wan.
Gava mekîne bi rê ve ketibû, herkê li cihê xwe melisîbû. Serên xwe be-ra ber xwe dabûn, destên xwe dabûn ber ruyên xwe û ponijîbûn. Kesî ji wan newêrîbû li dû xwe biniheriya. Hew carekê bi tenê, ew jî piştî ko ji malê bi dûr ketin, Robîn bi zorê li dû xwe zivirîbû û bi hêrseke gelekî mezin ko mirov digot qey hindik maye biteqe, bi çavên xwe yên ko zor didan sînorên xwe careke din jî li wê kuçeya ko zarokatiya wî lê bihurîbû niherîbû. Wê kuçeya ko ew ê tu carî ji bîra wî neçûya.
Bi niherîna xwe re diranên xwe hişk jidandibûn, bi herdu destan bi serê xwe girtibû û di cihê xwe de rûniştibû. Diya wî ew ber bi xwe ve kişandibû û xistibû himbêza xwe. Wî jî serê xwe danîbû ser sînga diya xwe û têra xwe giriyabû.
8

2. Bajarekî nû, jiyaneke cida...

»Tu ê welatên nû nebînî,
wekî din deryayan tu ê nebînî
dev ji te bernade ev bajar
li eynî kuçeyan tu ê bigerî...«
Konstantînos Kawafîs
Şeş sal. Şeş salên dûrî welatê xwe. Dûrî nas û dostên xwe. Niha, gava ko li ser wî zinarî rûniştibû û li behrê temaşe dikir, ew hemû tişt weke xeyalekê dihatin ber çavên wî. Weke wêneyekî kevin... Wê roja ko li mekîneyekê siwar bûbûn û her tiştên ko heta wê gavê jiyabûn li dû xwe hiştibûn, yek bi yek dihatin ber çavên wî û dikir ko çavên wî ji xwe ber sor bibin.
Ruyên kesên ji bo wan bi rê bikin li wê derê civiyabûn... Ruyên heval û hogirên wî, hezkiriyên wî yên kevin û hin dîmenên ko ji zarokatiya wî de di bîra wî de mabûn... Giş bi pêlên deryayê re dihatin xwe li zinarên bin lingên wî dixist û diçûn. Hesreta dilê wî jî bi pêlan re dibû yek û geh bilind dibû û geh dadiket.
Roj hêdî hêdî diçû ava. Deryaya kûr û bê sînor, di bin şewqa roja ko diçû ava de, weke ko ji binî ve hêdîka bête diqdiqandin, bi kubarî diliviya. Pêlên zirav, weke çarşefa ko bi ber bayekî sivik ketibe, xwe bi hunerî dihejand û dihatin li perê deryayê diketin. Herçî roj e, tîrêjên xwe yên herî qels li ser deryayê belav dikirin. Bi dû re jî, xwe bi ser kêlekê de xwar kiribû û li tîrêjên xwe yên li ser ruyê deryayê direqisîn, temaşe dikir. Çend keştiyên ji dûr ve xuya dibûn û kelekên ko weke hercar li nêzîkî peravê, hêdî hêdî diçûn û dihatin jî wê dîmena deryayê ya rojane temam dikir.
Di pirtûkekê de xwendibû; gava dilê mirov teng dibe, ji berdêla ko mirov were li kêleka deryayeke bêdawî rûne, ya çêtir ew e ko ji wê bireve. Ji ber ko her bêdawîbûn, xwasteka mirinê bi xwe re dianî, an jî xwesteka

di nava wê bêdawîtiyê de wendabûnê...
Ev bajarê mezin, ev bajarê ko şev û êvarên wî ji rojên wî xedartir, xwe dixist paş perda xwe ya tarî û lempeyên xwe pêdixistin. Deng hêdî hêdî ji bajêr dibiliya.
Ji bo Robîn, dem ji vêya bikerbtir nedibû. Çavên xwe berdabûn şewqa wê roja ko tîrêjên wê li ser ruyê deryayê direqisîn û bi dû re jî di neynika
9
REŞ Û SPÎ

mezin a li biniya wê re li xwe temaşe dikir. Lingekî xwe bera ser zinarên jêrê dabû. Lingê xwe yê din jî kişandibû ber xwe û sînga xwe dabû ser. Bayekî hênik û xweş, weke pêleke dilovan dihat û xwe li wî dixist, porê wî bi nazikî bi paş ve diavêt. Her ko wî ew hênikahî di canê xwe de his dikir, guhê xwe dida xişxişa pelên wan darên mezin ko li gora mesafeyekê bi rêkûpêk hatibûn rêzkirin û dixwast şahîdiyê li wê lihevkirina xwezayî bike.
Di bin daran de, hêşînahiya parkê ya xweş û fireh, mirov bi dilovanî dawetî himbêza xwe dikir. Herçî park e, hema li gora deryayê diçû û dawiya wê xuya nedibû. Di parkê de ji bo zarokan çend hêlan û du heb zernezîq jî hatibûn çêkirin. Li hebekî dûranê, meydaneke futbolê hebû ko bîstika din çend xortan tê de bi hengameyeke mezin bi topê dilîst, lê niha vala bû. Di nav hêşînahiyê û behrê de, peyarêyeke hebekî fireh hebû. Gelek kes sirf ji bo ko di vê riyê de bimeşin û ji xwe re li behrê temaşe bikin dihatin vira. Hinek kes jî hebûn ko kincên sportîf li xwe dikirin û dihatin li wê derê, di wê hewaya xweş de, ji xwe re baz dida.
Ew kesên ko bi malbatî ji bo seyranê hatibûn ber behrê, radibûn û diçûn malên xwe. Bala Robîn hê jî li ser behrê bû. Li milê wî yê rastê, du evîndaran hevdu himbêz kiribû. Keçikê serê xwe danîbû ser milê lêwik û

herduyan jî bi hevdu re berên xwe dabûn deryayê. Lêwik bi dengekî nizm tiştin ji keçikê re digotin, lê baş nedihatin fahmkirin. Li paş wî, çend keçên bedew û du-sê xortên din, li nav gîhê rûniştibûn û li ber dengê gî-tarê, bi melodiyeke giran, stranên evîndariyê digotin.
Dîsa di nav xewn û xeyalan re çûbû. Êdî tu deng nedibihîst. Çi gava ko li ber wî behsa evînê bibûya an jî li straneke evîndarî guhdarî bikiraya, tavilê deng ji doraliyê dibiliya û ruyê hezkiriyên wî yên kevn dihatin ber çavên wî. Nemaze jî yê Nûşînê.
Nûşîn... Niha ew li kû bû gelo, çi dikir, di çi rewşê de bû?
Hezar tişt anîn bîra xwe. Hema çi rewşên ko karîbûya Nûşîn tê de bûya, yek bi yek anîn ber çavên xwe. Wê gavê li ber xwe ket. Tasûwasek ket dilê wî. Tirseke derengmayinê... Bi dû re kesereke kûr kişand. Serê xwe bi kerb hejand û dîsa danî ser çonga xwe.
Dilê wî mişt kerb bû. Hew mabû ko biteqiya. Êşeke giran li serê wî pey-da bû. Kela girî ket qirikê. Çavên xwe girtin û vekirin, diranên xwe hişk şi-dandin. Lahnet li dinyayê, li jiyanê û hemû neheqiyan anî. Xeberên xerab ji hin kesan re dan. Hilma xwe bi lez stend û berda. Heta ko bîhna wî hebekî hat ber wî, hisa kîneke berlênayêgirtin di dilê wî de serî hildabû.
10

Gava li xwe hay bû, roj çûbû ava. Dinya tarî bûbû. Hêyv li ezmên, mî-na quloçekî zêrîn xuya dibû. Ji ber ko ji nişka ve çav li tariyê ketibû, serê wî çenekî gêj bûbû. Ji ber wê, hê nehatibû ser hişê xwe. Li dora xwe ni-hêrî. Lempeyên parqê û yên li peravê hatibûn rêzkirin, pêketibûn û heta ko ji wan dihat şewqa xwe di ser deryayê re diavêt dûranê, digihand wêneyê hêyvê yê li ser pêlên ko xof bera dilê mirov dida. Wê şewqa hanê, li ser ruyê wê behra ko ketibû rengê êvarê, dîmeneke bêhempa pêk dianî. Dengê pêlan, di bin wê ronahiyê de, mîna melodiyeke xweş li dorhêlê di-

hate bihîstin. Xişxişa pelan, ew melodiya ko bi dengê pêlan dest pê dikir, temam dikir. Mirov hema dixwast bi hezkiriya xwe re li cihekî weha, heta sibehê bi tena serê xwe di himbêza hevdu de raketa.
Hingî bayê sivik xwe lê xist, eniya wî cemidandibû. Hema bi lerzînekê bi xwe hisiya. Lingê xwe yê din jî bera jêrê, cem lingê din da û bi herdu destên xwe milên xwe mist dan. Dema ko di ser milê xwe re zivirî û li dora xwe niherî, tu kes nemabû. Hew ji dûranê, keçikekê û lawikekî bi destê hev girtibû û ber bi wî de dihatin. Ji derveyî wê jî dengê radyoya bufeya ko hebekî ji wî bi dûr bû, dihat bihîstin.
Beyî dilê xwe li saeta xwe niherî. Dereng bûbû. Destên xwe danîn erdê, lingên xwe kişandin jorê û bi aciziyekê rabû ser xwe. Bi dû re destên xwe ji gemara erdê dawişandin û meşiya. Piştî du-sê gavan, destên xwe avêtin bêrîkên xwe û li pakêta xwe ya çixareyê geriya. Pakêta xwe dît û çixareyek jê derxist. Dîsa destê xwe avêt bêrîka xwe û niftik jê derxist. Devê qutîka niftikê vekir û li hindurê wê niherî. Du darik bi tenê tê de mabûn. Li wî bayê hênik niherî. Herçî ba bû, her ko diçû xurttir dibû. Lêva xwe hebekî bi hêrs xwar kir û di dilê xwe de got:
»Hema, Xwedê bike ko ez bikaribim bi van darikan çixareya xwe pêbixim, yan na ez hew dikarim êgir jî li tu deveran peyda bikim.«
Rahişt darikekî û ji qutîkê kişand. Dîsa serê xwe rakir, wek ko bayê ew di destpêkê de hêdîka mist dida, lê niha xurttir dihat, kontrol bike, sekinî. Bi dû re, berê xwe ji aliyê ko ba jê dihat da alî û ew darikê niftikê di nava kefa destê xwe de bi lez vêxist. Tu nemabû ko bibe ber devê xwe û çixareya xwe pêbixe, darik vemirî. Darik bi hêrs avêt erdê û rahişt yê din. Hêrs bû. Dîsa berê xwe ji bayê ko li wî qulipîbû guhert û bi eynî awayî hewil da. Lê, tew berî ko pêkeve, darikê dawiyê jî vemirî û çû. Wî darikê xwe yê taliyê jî avêt erdê û bi hêrs pehînek lê xist.
Çixareya wî ya ko nikarîbû pêxistaya, di devê wî de bû. Çavên xwe bi

hêviya ko hinan bibîne û agir ji wan bixwaze, li dora xwe gerandin. Lê, tu

11

REŞ Û SPÎ

kes tune bû. Bufe jî ji wî gelekî bi dûr mabû. Di xwe re nedît ko ji bo pêx-istina çixareyekê vegere heta wê derê.

Ser dilê wî dişewitî. Dilê wî bêtir dibijiya çixareyê. Kurmên wî tev rabûbûn. Çixare ji devê xwe kişand û di destê xwe de girt.

Bîstikekê meşiya. Bi dû re çav li lawikekî piçûk ket. Sêniyek li ser serê lêwik bû. Lawik ber bi wî de dihat û digel dûrbûnê jî çixareya di devê wî de, sor dikir. Kêfa Robîn bi vê yekê hat cih. Wî jî lezand û gihişt ba lêwik. Herçî lawik e, umrê wî pir pir sêzdeh-çardeh sal bû. Zarokekî qamkinik û zehîfokî bû. Eyn wek darikekî bû. Serê wî piçûk, porê wî kin û çavên wî yên reş li gora serê wî pir gir xuya bûn. Tîşortekî gemarî bera ser pantorekî qont î riziyayî dabû. Rengê pantorê wî jê çûbû û çongekî wî jî qetiyayî bû. Bi awayekî bixwebawer dimeşiya û carê jî hilmeke dirêj ji çixareya xwe dikişand û berdida.

Gava Robîn nêzîkî lêwik bû, gavên xwe sist kirin û bi dengekî nizm, lê mîna ko emir bidiyê, bangî wî kir:

— Hişt hişt!

Lawik li deng zivirî. Robîn bi destê xwe bangî wî kir û got:

— Hela were vê derê.

Lêwik berê li Robîn niherî û bi dû re jî ber bi wî de hat. Sêniya ser serê xwe daxist û li ber wî sekinî. Robîn li wê sêniya ko çend heb mîdye tê de bûn niherî, destê xwe dirêjî wî kir û got:

— Hela ka agirê xwe, lo.

Lêwik, beyî ko bala xwe bide wî, çixareya xwe ji devê xwe derixist û dayê. Robîn berê li çixareya ko di destê lêwik î gemarî de bû, niherî. Zikê

wî bi lêwik şewitî. Bi dû re jî rahiştê û çixareya xwe pêxist. Hilmeke dirêj kişand heta nava dilê xwe û bi kêfxweşiyekê li dixana wê niherî.
Piştî ko çixareya lêwik dayê, pê re mizicî û jê pirsî:
— Tu ji kû yî, lo?
Lêwik ziq li çavên wî niherî û bi serbilindiyekê got:
— Ez ji Nisêbînê me.
Kenekî tenik li ruyê Robîn belav bû, pê re jî gunehê wî bi lêwik hat. Lê, nehişt ko lawik vê yekê fahm bike.
Hilmek ji çixareya xwe kişand. Vê carê bi kurmancî pirsî:
— Tu bi kurmancî dizanî, ne weha?
Lêwik serê xwe hebekî din rakir û xwe nepixand:
— Erê, weh!
Robîn destê xwe di serê wî de da, keniya û got:
12

— Tu çavê min î, lo…
Lawik jî di ber xwe de keniya û bêtir pesinî. Lê, ket ber fediyê jî. Ruyê wî sorbû. Gava Robîn li vê rewşa wî hay bû, ji bo ko wî zêde nexe ber fediyê, destê xwe li pişta wî xist û bi ken got:
— De biçe, oxir be ji te re.
Lêwik çixareya xwe dîsa xist devê xwe, sêniya xwe danî ser serê xwe û meşiya. Robîn hilmeke din jî li çixareya xwe xist û bîstikekê di pey wî re niherî. Li malbata lêwik fikirî. Dê û bavê wî ko nas nedikirin anîn ber çavên xwe. Serê xwe bi kerb kil kir. Bi dû re dîsa berê xwe da rêya xwe û çû.
Dengên li doraliyê, aramiyeke bêsînor bera nav dilê wî yê aciz dida. Bayê hênik, di wê êvara havînê de, nedihişt ko mirov ji germê of bibe. Dengê pêlên ko dihatin, mîna ko bixwazin xurtbûna avê nîşanî der û

dorê bidin, bi şerpîniyeke xurt li zinarên jêra peravê diketin û peşkên wan heta bi pênc-şeş mitroyan bilind dibûn. Pêlan di nav wê reşahiyê de dibiriqand û dikir ko çavên mirov ji deryayê bitirsin. Mirov digot qey tiştin esrarengîz di binê vê deryayê de hebûn. Gava roj diçû ava û tarî diket erdê, xusûsiyeteke tirsandinê dida behrê. Dibe ko behr ji vêya diêşiya jî; dibe ko ji ber wê ye ko êvaran har dibû û pêlên xwe bi şer-pîniyên dijwar li zinarên peravê dixistin. Û belkî ew tirsa ko li dora xwe belav dikir jî ji ber wê bû.

Robîn, dûrî van bîr û baweriyan, diponijî û bi gavên giran, beyî xwe dimeşiya. Ji nişka ve, bi dengê kenê pîrekekê li dû xwe zivirî. Dengê wî kenê hanê, bi carekê hatibû bihîstin û li der û dorê belav bûbû. Wî dengî, wî kenê ji dil ko mirov digot qey hatiye diqdiqandin, heyecanek xist dilê wî. Li şûna xwe lê heyirî û ma.

Deng ji deverin dûr hatibûyê. Xwediya vî dengî, mîna ko xwe di paş dîwarekî de veşartibû û ji ber ko wê jî bi xwe dizanîbû, bê ew ê bikaribe tesîreke çawa li ser yê ko dengê wê dibihîse bihêle, an ew ê bikaribe çi bîne

serê wî kesî, ji qazî weha dikir. Mîna ko dixwast encama biserketina xwe bibîne, hereket dikir.

Belkî dîtina vî tiştî heyecan jî dixist dilê wê. Di kenê wê de, hebekî dek jî hebû. Lê, ji ber ko bi carekê hatibû bihîstin û qut bûbû, Robîn li vêya hay nebûbû. Çavên xwe bi awayekî ecêbmayî, mîna serxweşekî li dora xwe digerandin. Kes xuya nedibû. Di ber xwe de got; »belkî xewn be jî,« û dîsa di rêya xwe de meşiya. Lê vê carê, ne weke cara din di nav ramanin kûr de û ji ber xwe ve. Ji ber ko vê carê, bi hêviya ko dîsa wî dengî bibi-

hîse, carê guhên xwe bel dikirin û guhdarî dikir. Lê, ji dengê bayê ko dar bi vir de û wê de dihejandin û dengê şerpîniyên pêlan pê ve, tu dengê din tune bû. Ji wî pê ve, kesekî din jî nexuyabû. Bi tena serê xwe bû. Mejiyê wî, mîna ko ji hemû ramanên din hatibe şuştin vala bû.
Ji derveyî dengê wî kenî, di hişê wî de, tiştek nemabû. Ew deng, hey ruyek jî bi xwe re dianî bîra wî. Lê wî ew rû nedişiband yê tu kesan. Pîrekeke esmer a xweşik û lihevhatî, dengnermeke çavmelûl, zane, bixe-bawer û esrarengîz... Ne mimkun bû ko Robîn aşiqî pîrekeke weha nebûya.
Di nav wê fikra îhtîmala xewnbûna wî kenî de vegevizî. Gelo kesî din jî ew deng bihîstibû an bi rastî jî xewn bû? Bi çavên şermokî hêdîka li do-ra xwe niherî, kes tune bû. Dilê wî hebekî rehet bûbû, bes hê jî li rewşa xwe diheyirî û tu mahne nedida wê. Ji wê rewşa xwe fahm kir ko nema dikare li hember tenêtî û bêpîrekiyê bisekine. Mîna ko bi taya evîneke platonîk ketibe, dilê wî bi wî şewitî û di ber re jî îmana wî ji wî çû.
Bi awayekî dilşikestî, di nav hestên tevlihev de, carê bi hêviya ko xwediya wî dengî bibîne li dû xwe jî diniherî û ji peravê bi dûr ket.
3. Şevbihêrk...
»Min navê xwe kola li bircên Diyarbekirê...«, Rojen Barnas
Şev nîvê şevê gihîşt malê. Mala wan li taxeke Nuhavabûyî bû. Herçî tax bû, ji sîteyan pêk dihat û dûrî navenda bajêr û sûkên wê bû. Ji bo ko mirov xwe ji navenda bajêr bigihanda wê taxê, diviyabû ko du mekîne biguhertana.
Di nav kolanin nîvtarî re derbas bû û hat ber sîteya ko mala wan tê de bû. Li gora sîteyên der û dorê, ev sîte, sîteyeke piçûk bû. Ji heyş biloqên apartmanên şeşqatî pêk dihat. Hewşa wê, ne gelekî mezin û fireh bû. Di hindurê wê de, ji bo zarokan du hêlan hebûn û ji bo ko xwe tê de biçer-ixînin jî tuneleke naylonî hatibû çêkirin. Ji bilî heyşt deriyên li hember

devê apartmanan ko li riyê diniherin, deriyekî wê yê mezin jî hebû.
Ji ber ko piştî saet dehan hemû deriyê din dihatin girtin, mirov di-viyabû di wî deriyê hewşê yî mezin re derbas bibûya. Gava Robîn di derî re derbas bû, ji qazî lingê xwe li derî xist û deng jê derxist. Bi dengê lingên wî re, nobedarê kal yê ko hertim di xew de bû, serê xwe di pencereya qulûbeya xwe re dirêj kir û li aliyê derî niherî.
14

Herçî nobedarê kal bû, bi roj şiveke dirêj, bi şev jî çifteyeke kevin di dest de bû û ji zarokan pê ve jî tu kes ji wî neditirsiya. Êvaran, piştî ko derî kilît dikirin û xelk diketin malên xwe, ew jî diket qulûbeya piçûk a li ber deriyê mezin û vediket. Ji ber ko Robîn bi vî tebîetê wî dizanîbû, her ko van saetan di deriyê mezin re derbas bibûya, ji bo ew ji xewa wî şiyar biki-raya, wî dê ji qazî, lingê xwe li qutîk û tenekeyên li der û dorê bixista û deng mengin derxistana.
Gava serê mêrik li ber camê xuya bû, Robîn ew dît, lê weke ko hercar dikir, dîsa silav nedayê û weke ko hayê wî jê çênebûbe meşiya û ket hewşê. Nobedarê kal, dîsa weke hercar serê xwe bi hêrs hejand û xeber jê
re dan.
Lempeyên malan, ji derveyî du-sê heban, giş vemirîbûn. Çend lem-peyên ko bi tenê dikarîbû dora xwe rohnî bikin, wêneyê derengbûna şevê temam dikir. Zilamekî ji navê û ber bi jor de tazî û serrût li balqona xwe rûniştibû û çixareya xwe sor dikir.
Gava asansor li qatê sisiyan sekinî û Robîn deriyê wê bi dehfekê vekir û hat ber deriyê mala xwe, ewilî çav li ronahiya ko di bin derî re xuya dibû ket. Lempeya wan jî vêketî bû. Li wê îhtimalê fikirî ko yên malê ketibin meraqa wî û li benda wî mabin. Ji xwe re li bersivan geriya, hin bersiv

peyda kirin. Bi dû re bi gazinî ji xwe re got:
— Dev jê berde, lo!
Kilît ji bêrîka xwe derxist û derî vekir. Bi dengê derî re, deng ji tembûra hindur jî biliya. Robîn bi dengê tembûrê re veciniqî û serê xwe rakir. Wê gavê têgihîşt ko ew roj roja şemiyê bû û Bedirxanê hevalê birayê wî dîsa hatibû ba wan.
Hêwan tije bû. Hemû kesên malê hê şiyar bûn û şevbihêrka wan xweş digeriya. Robîn bi ken ket hindur û silav da. Ew û Bedirxan çûn ruyê hevdu û rûniştin. Bedirxên tembûra di destê xwe de danî kêleka xwe. Herduyan jî li halên hevdu pirsî û bi dû re ketin nav sohbetê.
Hêwana wan mezin bû. Mêvan li ser dîwanê rûniştibû. Li ber wî sehpeyek hebû. Li ser sehpeyê jî xwelîdankeke cam û pakêta çixareyê hebû. Li kêleka Bedirxên, bavê Robîn, Resûl Begê heftêsalî rûniştibû. Birayê Robîn î mezin, Mîtanî jî li qenepeya kêleka wan ya dirêj, li cem jina xwe û xweha xwe rûniştibû. Diya wan weke hercar li erdê, li ser balgîfekê rûniştibû û destekî xwe danîbû erdê û yê din jî danîbû ser çonga xwe. Lawikê malê yê piçûk Serdar û xweha wî ya ji wî piçûktir Meryem, li erdê li kêleka diya xwe rûniştibûn. Robîn jî xwe dabû kêleka Meryemê û

15

REŞ Û SPÎ

ew xistibû bin çengê xwe.
Bedirxan dostekî malbata wan bû. Wan piştî hatina vî bajarê mezin hevdu nas kiribû. Ji xwe, zû bi zû xwe li kesî nedigirt û ji ber vê yekê jî hejmara dostên wan ên mîna Bedirxên, ne ewqasî zêde bû. Yên ko hebûn jî bi piranî ew kes bûn ko mîna wan mecbûr mabûn ji welêt derkevin. Herçî yên mîna wan bûn, li vî bajarî, mîna kesên ko ji ber mirinê xelas bûne xwe li hev digirt. Ji xwe rewşa wan jî ne ji wê rewşê cida bû. Dîsa jî

wan baweriya xwe bi herkesî nedianî.
Bedirxan zilamekî zeîf û dirêj bû. Simbêlên wî yê sor û ruyê wî yê boz, pir li hevdu dikir. Ji ber ko porê wî ji pêşiyê piçekî weşiyabû, eniya wî fireh bûbû. Çavin wî yên gir û şîn hebûn ko mirov dikirin heyranê xwe. Gava dikeniya, çavên wî wenda dibûn û diranên wî yên ji çixareyê nîvzerbûyî di bin simbêlên sor re xuya dibûn. Pir xweş li tembûrê dixist. Gava wî radihişt tembûrê, deng ji yên li dora wî gişan dibiliya. Zilamekî têgihiştî û xweşsohbet bû. Carinan, welê dihat şevbihêrka wan û şevder li cem wan dima.
Robîn di nav kesên din yên ko diçûn û dihatin mala wan de, cihekî taybetî dida Bedirxên. Gava wan hevdu didît, li ser derdên xwe dipeyivîn û li tembûra wî guhdarî dikir, hêviyên dilê Robîn geş dibûn. Ji ber wê, kêfa wî hatibû cih û ew hestên tevlihev û bêmahne yên li peravê pê re peyda bûbûn, giş ji bîr kiribûn. Niha, ji bo şevekê bûya jî derdên hesretê û xerîbiyê dê xwe bidaya alî.
Bedirxan û dengê wî… Dîsa rahiştibû tembûrê û li nava dilê hemû evînên nîvcomayî dixist.
Robîn carinan ji xwe re digot:
— Mirov hema ji mehê carekê be jî li wî û tembûra wî guhdarî bike, bes e. Wê gavê, ne derd dimîne û ne jî kul.
Bedirxan piştî ko qedeha çayê ya di destê xwe de danî ser sehpeyê, bi Robîn re bişirî û dest bi stranekê kir. Wî jî êdî dizanîbû ko Robîn ji dengê wî û ji stranên wî hez dike. Bivê nevê jî yên li ser Diyarbekirê…
Kenekî tenik li devê wî peyda bû û ruyê wî bi nazdarî neqişand. Robin carê serê xwe bi ken ji wî re dihejand û hevaltiya dengê wî dikir.
Piştî çayê, fêkî hat xwarin û piştî fêkî jî dîsa di pey bêdengîyeke kurt re dengê tembûrê bilind bû. Bedirxên ji wan re lê dixist, gişan bi hev re digot. Radibûn direqisîn, kulên dilê xwe derman dikirin. Herçî Robîn e, ga-

va li ber tembûra Bedirxên direqisî, te digot qey tê guhertin û dibe yekî 16

din. Carnan gava li vê rewşê hay dibû, ew jî bi xwe şaş dibû.
Heta ko Bedirxên strana xwe temam kir, gişan xwê dabû. Westiyabûn. Rûniştin. Wan demeke din jî li kilamên Bedirxên guhdar kir. Gava xwê-dana canê wan zuha bû jî canên gişan giran bûbûn û vê yekê xwe di çavên wan re dida der. Çavên gişan sist bûbûn. Êdî xewê zora wan dibir. Yên çûn raketin, yên di şûna xwe de çavên wan diçûn ser hev… Civat hêdî hêdî belav bû. Bedirxan, Robîn û Mîtanî jî di nav wê bêdengiya êvarê de man. Piştî kêf û şahiyê, cihên xwe xweş kirin û ketin nav sohbetê.
4. Xewnên derketîyan naşibin yên tu kesî
Piştî ko Bedirxan û Mîtanî jî çûn raketin, li hêwanê Robîn bi tenê mabû. Lempeya hêwanê vemirand û derket, li balqonê rûnişt. Çixareyek pêxist, bêhneke dirêj lê xist û sekinî. Westiyabû. Çavên xwe di cihekî de cit kiribûn, lê ne ji bo ko li tiştekî binere. Di wî cihî de, xwe bera dinyayeke din dida û gelek tişt didîtin. Dinyayeke din, dîmenên ko ji demeke kevin di bîra wî de mabûn û niha yek bi yek dihatin ber çavên wî…
Nûşîn di himbêza wî de bû. Serê xwe danîbû ser sînga wî. Robîn ji aliyekî ve bi wê re dipeyivî, ji aliyekî ve jî tiliyên xwe di nav porê wê de di-gerandin. Pişt re, destê xwe ber bi situyê wê de bir û bi tevgerên giran der-
ket jorê. Destê xwe hêdî hêdî di ruyê wê de da û li lêvên wê geriya. Tiliyên xwe li ser lêvên teze û nermik gerandin. Herdu jî ji heyecanê dilerizîn. Lê Robîn bêhtir ji ser hişê xwe ve çûbû.
Nûşînê bi destê wî girt, ber bi devê xwe de bir û ramûsand. Hinavên Robîn mîna ko ketibin nav qeşayê, lerizîn. Nûşînê mijangên xwe ber bi jorê ve rakirin û di bin mijangên dirêj re, li çavên wî niherî. Gava li çavên

hev diniherî, lerzîna canê wê xurttir dibû. Çavên wê yên reş û girs xwe bi temamî bi destê heyecana dilê wê ve berdabû. Dûmana agirekî xurt ji wan difûriya. Lêvên wê hê jî diricifîn. Nikarîbû bipeyiviya. Mirov digot qey ji sermayê diqefile û li cihekî ko xwe lê germ bike, digere.
Robîn destê xwe dîsa avêt ruyê wê û ew hêdîka ber bi xwe ve kişand. Serê xwe ber bi wê de bir û lêvên xwe dan ser yên wê. Lêvên hevdu mêtin û her mêtin. Ji hev têr nedibûn. Wan hevdu bi awayekî weha maçî dikir ko mirov digot qey hindik maye hevdu bixwin. Bi dû re jî wan destên xwe li nava hev gerandin û hevdu himbêz kir. Robîn ji aliyekî ve ew dimêt û ji aliyê din ve jî destê xwe ber bi paxila wê ve dibir. Gava paxila wê vekir, herdu cotên memikên girover ên belbûyî û sincirî derketin or-

tê û hişê mabû jî bi xwe re bir. Robîn jî êdî nema dizanîbû bê çi dikir. Serê xwe xist nav pêsîran û bêhna canê wê kişand heta nava dilê xwe. Pêlên heyecana ko bi daxwazeke bêsînor û bêrîkirineke xurt a nedîtî û hezkirina du dilên pak û mişt evîn her ko diçû, bilindtir dibûn û ew bi yekcarî dabûn ber xwe.
… Nûşîn, ax Nûşîn. Delaliya min... Tu li kû yî?…
Serê wî mîna pelekî darên payizê hêdîka ket aliyekî milên wî. Çavên wî çûn ser hev û carekê jî di xwe re nedît ko xwe bide ser hev û rabe ser xwe. Laşê wî bi temamî sist bûbû. Destên wî, enîşkên wî, milên wî, çong, ling û çîpên wî… Robîn bi temamî mest bûbû. Mîna yekî ko serê xwe danîbe ser sînga hezkiriya xwe. Mîna mirîdekî ko di terîqetê de bi dizbê ketibe. Mîna serxweşekî ko heta sibehê araqa safî vexwaribe û di cihê xwe de di xewê re çûbe. Mîna eroînmanekî ko hê nû eroîn kişandibe. Wî jî şeraba evînê bi ser xwe de dakiribû û di cihê xwe de mest bûbû. Niha ji ser hişê

xwe çûbû û di nav evînê de vedigevizî.
Wî digot qey, ne xwîn, lê tiştekî din di damarên wî de digeriya û ew bi temamî hogirî xwe dikir û dihişt. Vê yekê, Robîn ewqasî bi xwe ve girê dida ko êdî wî xwe tam mîna hêsîrekî didît
Herkes di xeweke şêrîn de bû. Robîn li balqonê, li ser kursiyeke piçûk rûniştibû û pişta xwe dabû dîwêr. Serê wî bi zorê li ser laşê wî disekinî. Destekî wî li ser çonga wî bû, yê din jî ketibû kêleka wî. Çavên wî jî westiyabûn û carê ji ber xwe ve dihatin girtin. Gava vedibûn jî di wê tariyê de dibiriqîn. Hê nû çavên wî çûbûn ser hev, bi dengê azana sibehê bi xwe hisiya. Berê dengê melayekî ji devereke dûr hat. Dengekî xweş, dengekî bi şevê re lihevkirî… Piştî wê xewnê, dengê vî meleyî bi Robîn xweş hatibû û aramiyek bera dilê wî dabû.
Deng her ko çû pirtir bûn. Melayekî din jî dest bi azanê kir. Bi dû re dengên hemû melayên mizgeftên der û dorê mîna koroyekê tev li hev bûn. Yekî xelas dikir, yekî din dest pê dikir. Mirov digot qey di ber hev-du de dibetilîn. Piştî ko azan qediya, Robîn guhê xwe da dengên lingên du zilamên ko ber bi riyê ve dimeşiyan. Bi dû re mekineyekê ji dûranê kir giregir. Li apartmanên der û dorê, lempeyên çend malan vêketin. Ji xaniyê jora wan, dengê giriyê zarokan dihat. Ji nav wê reşahiya şeva ko haziriya çûnê dikir, bîhna rojeke nû difûriya.
Robîn hilma xwe berada û rabû ket hindur. Çû odekê û xwe li ser nivînên ko ji bo wî, li kêleka yên Bedirxên, hatibûn danîn dirêj kir. Janekê xwe li serê wî girtibû. Çavên wî bêtir sist bûbûn. Çer ko serê xwe
18

danî, di xewê re çû.
Di nava valahiyeke tarî de bû. Heta ko ji destê wî dihat, çavên xwe vedikirin û li dora xwe digerandin da ko têbigihêje bê li kû bû. Ji tariyê pê

ve, tu tişt nexuya bû. Bêhna wî teng bû. Dizanîbû ko di xewnekê de bû û xwast ko ji wê xewnê şiyar bibe. Lê, kir û nekir nikarîbû. Destên xwe li dora xwe dipelandin. Destên wî di valahiyê de diçûn û dihatin. Wî xwast gava xwe biavêje, lê belê lingên wî ji cihên xwe nediliviyan. Dîsa li dora xwe niherî. Her dever tarî bû. Ji dûranê, hin tişt ber bi çavên wî ketin ko di tariyê de diçûrisîn û ronahiyeke gelekî qels didan dora xwe. Hê Robîn li wê ronahiya qels diniherî, gomeyekî ecêb ko agir jê dibariya bi ser wî de
hat û di ber serê wî re derbas bû. Xwe bi zorê ji ber da alî. Hema hindik mabû ko ew gome li serê wî biketa û ew perçe perçe bikira. Ji tirsan, dilê wî dikir gupegup. Sînga wî bi lez radibû û dadiket. Robîn fikirî ko ew li fezayê be. Piştî ko feza anî bîra xwe, tiştên ko di nav tariyê de veşartî bûn, hêdî hêdî kifş bûn. Bi dû re têgihişt ko ew tiştên bîstika din diçûrisîn, stêrk bûn. Serê xwe rakir û li dora xwe niherî. Çend stêrk di nav wê reşahiyê de, li vî alî û wî alî belav bûbûn.
Çawa hatibû vira? Ew ê çawa vegeriya malê? Dê û bavê wî hatin bîra wî. Gelo wî dê ew dîsa bidîtana? Le yên din? Xwişk û birayên wî? Hevalên wî? Ma gelo wî dê bikarîbûya xwe ji vira xelas bikira? Ma qey miribû? Ma qey mirî giş dihatin vira? An jî bi tenê yên ko baweriya xwe bi Xwedê ne-dianîn dihatin vira?
Ev pirsên ko tirs dixist dilê wî, di serê wî de diçûn û dihatin. Robîn tu bersiv ji wan re peyda nedikir. Hê li pirsên bêbersiv difikirî ko ji cihekî nediyar dengê azanekê hatê. Veciniqî. Hey li dora xwe diniherî. Nizanîbû, bê dengê vê azanê ji kû dihat.
Êdî baweriya xwe baş bi wê anîbû ko hatibû dinyaya din. Li xêr û gune-hên xwe fikirî. Bihuşt û dojeh anîn bîra xwe. Ka gelo kîjan ji wan cihê wî bû? Ji navê dojehê tirsiya. Qêrînek bi dilê wî ket; lê, hê xwe negihandibû devê wî, ji nav wan stêrkên ko diçûrisîn yek ber bi wî ve hat. Gava li vî

tiştî hay bû, di cihê xwe de mat ma. Çavên wî bi tirs vebûn. Stêrk hat û li ber wî sekinî. Hey li dora xwe dizivirî û diçûrisî. Robîn destê xwe hebekî jî bi tirs dirêjî wê kir. Gava destê wî gihaşt stêrkê, stêrk ji nişka ve bi paş de vekişiya û mezin bû. Her ko mezin bû, xweşiktir bû. Her ko xweşiktir bû, bala Robîn bêtir kişand ser xwe. Meraqa Robîn bêtir bû.
Ev çi bû? Ji nişka ve perdeyeke reş hat û xwe li çavên Robîn pêça. Robîn bi destê xwe, ew perdeya reş ji ser çavên xwe da alî. Perdeya reş bû ke-

vokeke spî û bi firê ket. Çû xwe li bin guhê stêrka mezin xist. Bi li-hevketina stêrkê û kevokê re, li doraliyê dengê bayekî xurt belav bû. Stêrk bi carekê bû ewrekî ji berfê. Dengê azanê jî hêdî hêdî kêm bû.
Kevoka ko xwe li stêrkê xist û ew guhert, çû û xwe li ser wê danî. Kevok jî hêdî hêdî hat guhertin. Kevok mezin bû, mezin bû û bû zilamek. Lê belê, ka ruyê vî zilamî? Mijê xwe li ruyê zilêm girtibû. Robîn destê xwe hejand û mij belav bû.
Robîn mîna ko mirov kûzeke ava sar bi ser wî de dake, di şûna xwe de mat ma. Ew zilamê ko ruyê wî zelal dibû, her ko diçû dişibiya birayê wî. Aha, bejna wî ya dirêj. Aha, simbêlên wî yên reş î gir ko lêva jorê heta ya jêrê dinixumand. Aha, ew ruyê spî û gurover î xweşik. Aha, ew temberiya wî ya ji kêlekê ve hatibû vekirin. Aha, ew çavên wî yên reş. Aha, ew kenê wî yê bêhempa. Belê, belê ew bû.
Dengê Robîn ji xweber derket:
— Seydo!
Yê hember wî, serê xwe bi kêf bi kêlekê ve xwar kir û bişirî. Robîn kincên li wî bûn, nas kirin. Wî cara dawîn, ew di nava wan kincan de dîtibû. Qutikekî pîqut î spî û şalekî reş. Ruyê wî jî hê mîna berê

dibiriqand.
— Robîn!
Çavên Robîn melûl diniherî. Mat bûbû. Heyirîbû. Herdu destên wî ketibûn jêrê. Situyê wî xwar bûbû.
Hemû hezkirina wî ya li hember Seydo, xwe di çavên wî re dida der. Çavên tije bûn. Xwe negirt; hêsirên germ hêdîka xwe bera xwarê da û herikîn. Dengê wî yê lerzokî bû axîneke kûr û di sînga wî re derket jorê:
— Seydo…
Destên xwe yên sistbûyî hêdîka ber bi wî ve dirêj kirin. Destên wî nedigihîştin Seydo.
Seydo bi destên xwe ve, di nav tariyê de cihek nîşan da û li wî aliyî ni-herî.
— Tu wê derê dibînî, Robîn?
Robîn li cihê ko wî nîşan dida niherî, lê ji tariyê pê ve tu tişt nedît. Çi qasî hewil da jî tiştekî din xuya nebû.
Seydo dîsa li wî cihê ko Robîn dikir û nedikir nikarîbû bidîtaya, niherî û dewam kir:
— Di nava bexçeyekî fireh re çemekî dirêj û xweşik diherike, Robîn. Ez herroj heta êvarî, li ber wî çemî me. Dengê avê û yê çivîkan tev li hev dibe. 20

Li wira, hertim bayê hênik tê. Tu kîjan celebê dar, nebat, giha û kulîlkan bixwazî, tu dikarî li wira peyda bikî. Tu kîjan celebê teyran bixwazî, tu dikarî bibînî. Çivîk, reşêle, quling, hechecîk, başoke, hudhud… Her celeb xweşî heye, lê ez bi hesreta dengê însanekî me, Robîn.
Serê xwe bi kerb kil kir û bera ber xwe da, dengê wî ji nişka ve hat guhertin:
— Ez pir bi tenê me, Robîn...

Robîn bi awayekî ko ew ê jî bi dû re lê ecêbmayî bimîne, jê pirsî:
— Ma qey tu hevalên te li vira tune ye?
Mîna ko li tiştekî bigere, herdu destên xwe rakirin û sekinî. Bi dû re hat bîra wî.
— Mesela, yên ko mîna te hatibin kuştin...
Seydo bêhnekê fikirî. Keserek kişand û dîsa bi eynî dengê xwe yê bikerb, got:
— Carinan…
Peyva xwe temam nekir. Kela girî ket qirikê. Xweziya xwe bi zorê daqurtand. Li çavên Robîn niherî û bîstikekê bi vî awayî ma. Lêva xwe gez kiribû. Bi dû re, berê xwe guhert û domand.
— Carinan dengê hin kesan tê min. Wê gavê, ez bi heyecan radibim û li dora xwe digerim, lê… lê…
Dîsa serê xwe bi kerb hejand û ji bo ko bikaribe bipeyive hebekî hewl da xwe û dewam kir:
— Lê tu kes nayên, Robîn...
Robîn dengê wî bi zorê bihîst. Ji ber ko li hember vê rewşa xedar, tu tişt ji destê wî nedihat, bêtir dev li lêva xwe dikir. Ji hêrsa dikira biteqiya. Di ber re, hêsirên wî hê jî bi giranî diherikîn.
Herduyan jî serên xwe bera ber xwe dan. Bi dû re, Seydo serê xwe rakir, ji serî heta binî li wî niherî, dilê wî bi halê wî şewitî.
Got:
— Ez pir aciz dibim, Robîn. Çima tu carinan bi ser min de nayî?
Robîn bersiv nedayê. Serê wî hê di ber wî de bû. Herdu jî bîstikekê bê deng sekinîn. Robîn di bin mijangên xwe re ziq li wî diniherî. Şûna mîrata guleyê nexuya bû. Serê xwe rakir û bala xwe da eniya wî. Li şûna guleya mirinê geriya. Divê li ser çavê wî yê rastê dewsa derbê hebûya. Ji ber ko wê roja reş, wê roja ko bajarek di şînê de vegevizandibû, guleya xeze-

bê ji xafil de li paş stuyê wî ketibû û di wira re derketibû. Lê a niha, dewsa wê hatibû girtin.

21

REŞ Û SPÎ

Seydo dîsa serê xwe rakir û got:

— Robîn!

Destê xwe dirêjî wî kir. Dengê bayê bîstika din, xurttir bûbû. Ewrê ko Seydo li ser bû, her ko diçû bi dûrtir diket. Tarî dîsa diket navbêra wan. Xumamê xwe bera ser çavên Robîn dida. Êdî hema hema bi zorê hevdu didît. Dengê bayê ko êdî tam xurt bûbû, bi ser yê wî diket. Seydo ji bo ko dengê xwe bigihîne wî, bang dikir û dipeyivî.

— Robîn! Tu çi dikî, bikî û were. Min bi tenê nehêle.

Dengê Seydo di nava wê tariyê de olan dida û wenda dibû. Robîn xwast bide dû wî. Lê lingên wî hê jî nediliviyan. Destê xwe dipeland, sînga xwe bi pêş de diavêt. Nedibû. Kula dilê wî bû qêrîneke xurt û derket:

— Seydoooo!...

Seydo çû û di nava tariyê de wenda bû. Lê Robîn hê jî bang dikir:

— Seydoooo!..

Dengên wan hew gihîştin hevdu. Robîn dev ji hewildanên xwe berda û sekinî. Giriya. Bi dengê hêl giriya.

Diqîriya û digiriya. Qêrîn û giriyê wî agir bi dilan dixist. Her ko peyva Seydo ya dawiyê dihat bîra wî, orînek pê diket ko sawa wê bi ser wî bi xwe

jî diket. Peyva herî taliyê, mîna kelemekê di dilê wî de rabûbû. Pir li ber xwe ketibû. Hey digiriya. Ji bo sekinandina vî giriyê hanê, tu hewil neda xwe. Bi dû re kûr kûra wî hêdî hêdî kêm bû. Deng jê biliya. Dengê Seydo yê ko jê re digot »were« hey di mejiyê wî de olan dida.

5. Hertiştî bi kuştinekê dest pê kir...
»Mirin ne ji bo yê ko miriye, ji bo yên ko li dû mane felaket e.«, Epicure
Gava çavên xwe vekirin, ji ber girî hê jî niqrîsk vedidan. Hêrsekê ew dabû ber xwe. Ruyê Seydo hê li ber çavên wî bû. Tişt miştên wê xewnê dîsa anîn bîra xwe. Ew tariya bêsînor, dengê azanê, tirsa wî ya ji Xwedê… Heta, cennet û cehennem jî. Bi dû re, li wî bexçeyê ko av tê re diherikî, fikirî. Wê xweşiya ko Seydo ji wî re behs kiribû… Ji vê dinyayê cida, dinyayeke din...
Wî jî nizanîbû, bê çawa dîsa di xew re çûbû. Bi dengê derî re, çavên xwe vekirin. Xuya bû, Bedirxan berî wî şiyar bûbû. Niha derdiket derve. Bêcemeyê Robîn li xwe kiribû. Piştî ko ji nav nivînan derketibû, hema milên xwe di qutikê xwe re rakiribûn. Gava di derî re derdiket, hê jî
22

bişkokên wî digirtin. Piştî ko ew derket, Robîn jî ji nav nivînên xwe rabû. Bi dû re, diya wî Leyla Xanimê derî vekir û ket hindur. Robîn bala xwe da wê. Leyla Xanim pîrekeke dirêj û qelew bû. Fîstanekî gewr û gulgulî li wê bû. Leçekeke spî li serê xwe gerandibû. Di bin fîstanê wê re, delingekî di rengê fîstên de xuya dibû. Robîn xwe li xewê danî. Leyla Xanim çû nivînên Bedirxên pêçan û rakirin. Robîn jî bêyî ko deng bike, her li wê niherî. Leyla Xanim derket û çû.
Robîn diya xwe di rojên xerab de nas kiribû. Dizanîbû, bê ew çi qas xurt e. Heke ne ji bayê ko di çongên wê de bûya, niha dikarîbû qayiş bi ciwanan re jî bikişanda. Di zarokatiya wî de, giş li dora xwe dicivandin û ji wan re çîrokên dûdirêj û xweş ko tu carî ne ew, ne jî zarokên wê ji wan aciz dibûn, digotin. Rojên ko zarokên wê meraq dikir, bê diya wan çawa dikarîbû van çîrokan gişan bibêje û çawa giş dihatin bîra wê, bi kuştina Seydo re bi yekcarî qediyabûn.

Rojek ji rojên herî germ yên havînê bû. Kuçeya ko mala wan tê de bû, ji serî heta binî bi mirovên ko bi bûyerê hisiyabûn ve hatibû dagirtin. Wê şevê, ew û hin hevalên xwe, li mala dostekî xwe raketibûn. Serê sibehê, dengê zîla telefonê hatibû bihîstin. Mahzûbên xwe beriya herkesî gi-handibû ahîzeyê. Bi dengê telefonê re, Robîn jî ji nav nivînan pengizîbû. Û gava mahdê mahzûbanê wî bi temamî qulipîbû û ahîze bi zorê dirêjî wî kiribû, ji tirsan bûbû wek sipiya firkandî.

Dengê di telefonê de, yê xwişka wî bû. Digiriya. Diqîriya. Li xwe dix-ist, dikir haho. Pepûk pepûka wê bû. Dengê pepûk û hahoya wê di felekan re derdiket.

— Pepûk pepûk! Haho, Robîno! Mala bavê min şewitî. Agir bi mala me ket. Haho, ji bo Xwedê, zû were.

Robînê ko hê xew ji ser çavên xwe neavêtibû û berê wec lê zer bûbû, êdî bi temamî ketibû tev. Lêvên wî lerizîbû û bi zorê gotibû:

— Keçê, te xêr e? Çi qewimiye?

Gava xwehê gotibû:

— Seydo!.. Seydo!

Bi peyva »Seydo« re veciniqîbû. Beyî hişê xwe peyivîbû.

— Tu dibêjî çi keçê? Çi bi Seydo hatiye?

Heyecan ketibû dilê wî jî. Tirsa tiştê herî xerab ew hêsîr girtibû. Hew dizanîbû, bê divê çi bigota. Gava xwehê gotibû; »Devê min bişikê, Seydo birîndar e«, wî gotibû qey tiştek ji dilê wî qetiyabû. Ya ko jê ditirsiya qewimîbû. Dest û lingên wî pê re sist bûbûn. Devê wî êdî bi zorê

23

REŞ Û SPÎ

geriyabû. Wecê wî weha zer bûbû, weha zer bûbû ko mirov digot qey xwînê xwe bi temamî ji damaran kişandibû û mirov çil xencer lê bixistana

jî piça xwînê jê nedihat.
Wî jî nizanîbû, bê çawa pirsîbû:
— Kê berdayê? Haho!
— Em nizanin. Zû were! Belkî hûn negihêjin ser jî.
Robîn dê bi dû re têbigihîşta ko çi qasî bilezanda jî ew ê nikarîbûya bigihişta ser Seydo. Xwişka wî ji bo ko ew zû bihata û devê wê negeriyabû ko di telefonê de bigota »Seydo ji zû ve miriye,« rastî jê veşartibû. Belkî jî
ji bêhişî weha gotibû.
Destê wî li ahîzeyê sist bûbû. Ew û ahîze bi hevdu re li erdê ketibûn. Dengê şingîniya ahîzeyê û yê gurmîniya wî tev li hevdu bûbûn. Gava hişê Robîn hatibû serê wî, dîtibû ko hevalên wî û mahzûbanê wan lewento di-da ber bêvila wî. Hevalê wî Şêxo bi meraqeke mezin li wî niherîbû. Geh li mahzûbên niherîbû û geh jî li Robîn niherîbû. Wî texmîn kiribû ko hey tiştekî xerab qewimîbû, lê çi bû, pê nizanîbû. Şêxo ji niherînên wî tir-siyabû. Hew mabû ko ji meraqan ew jî biketa û bimira.
Her pirsîbû:
— Kî bû, lawo? Çi qewimiye?
Robîn nizanîbû, bê dê bi çi awayî jê re bigota. Ji xwe devê wî tev nedi-geriya. Piştî ko bêhna wî hebekî hatibû ber wî, bi zorê gotibû:
— Mehabad bû.
Şêxoyê ko ew û Robîn bi hev re mezin bûbûn û wek birayê xwe ji wî hez dikir, bêtir ketibû meraqê. Tirsa wî mezintir bûbû; »Xêr bû, gelo? Mehabad çima vê şeveqê geriyabû?« Bes ji rewşa wî têgihîştibû ko tiştekî xerab bûye. Pirsên di hindurê wî de, ji nişka ve ji devê wî derketibûn:
— Xêr bû? Digot çi? Çi qewîmiye?
Pêlekê Robîn dabû ber xwe. Pêla heyecan û tirsê, pêla bêhêvîtiyê… Wek pelê çilo lerizîbû. Canê wî sist û giran bûbû. Nema dikarîbû li

tiştekî din bifikiriya. Herdu destên wî yên sist bûbûn ketibûn ber wî û stuyê wî xwar bûbû. Devê wî bi dîsa zorê geriyabû û sê gotinên di jahra xemgîniyê de dakirî, bi dengekî lerzokî ji devê wî derketibûn û bûbû kûrkûra wî:
— Bera Seydo dane...
Şêxo di cihê xwe de sar mabû. Peyv jê çênebûbû. Destê xwe dabû ber eniya xwe û beyî ko li xemgîniya ko ji nişka ve xwe li wan girt hay bûbe, hema hêdîka çongên wî sist bûbûn û xwe bi dîwêr girtibû û xwarî erdê
24

bûbû. Çavên wî ji xwe berê tije bûbûn û hêsirên bêkontrol barandibûn. Robîn, diranên xwe hişk şidandibûn. Qet tev neliviyabû. Mirov digot qey çi qêrînên ko hebûn, di hindurê xwe de dabûn ser hevdu û hindik mabû ko giş di devê xwe de biteqandana. Ne li ser hişê xwe bû. Çavên xwe di dîwarê hember de cit kiribûn û sekinîbû.
Şêxo jî ji hal de ketibû û dest bi niqrîska kiribû. Diviyabû tiştek bikira. Dilê wî ewqasî êşiyabû ko tu nemabû bisekiniya. Hevalên wî yên din jî hema di cihê xwe de mîna wan, weke ko di wêneyekî de bin, mat mabûn. Nema dizanîbû, bê dê çi bikira. Ger ne ji mahzûbên bûya, kî dizanîbû, bê ev rewşa hanê dê heta kengî dewam kiriba. Mahzûbanê wan ê ko di quncikekê de mat mabû û li wan temaşe dikir, ji nişka ve lê hay bûbû ko divê bilezanda. Ji ber vê yekê, bi dengekî biberger ji Robîn û Şêxo re gotibû:
— Ji bo Xwedê, rabin ser xwe! Divê em bilezînin.
Wê gavê, giş bi hevdu re rabûbûn, kincên xwe bi lez û bezê li xwe kiribûn, Şêxo ketibû milê Robîn, ew rakiribû ser piyan û bi bazdan berên xwe dabûn taxa mala wan. Gava di sûkê re derbas bûbûn, xelkê giştî li wan niherîbû. Heta ko ew ketibûn kuçeya mala Robîn jî wan nexwastibû

bawer bikin. Lê, gava ko çav li wan însanên ko li herdu aliyên kuçeyê rêz bûbûn ketibûn, tirsa wan mezintir bûbû. Giş bi hevdu re rawestiyabûn û li xulxuleya mirovan niherîbû.
Rewşa qelebalixiyê, Robîn bêtir tirsandibû. Ji ber vê yekê, di nav qelebalixiyê re, dîsa dest bi bazdanê kiribû. Hevalên wî jî dabû dû wî. Mirovên xemgîn ên ko li ber dîwêr rûniştibûn, gava Robîn di ber wan re derbas bûbû, kiribû niçe niç û serên xwe bi kerb bera ber xwe dabûn. Divê heta ko mirov bi çavên xwe nebîne bawer nake. Êdî ew jî baş têgihîştibûn ko tiştekî pir xerab hatibû serê mala wan. Deriyê hewşê vekirî bû, lê yê xênî girtî bû. Ne tiştekî xerab bûya, ev derî tu carî nedihat girtin. Robîn bi kulman, li derî xistibû û qêriyabû, da ko hin kes derî lê vekin. Derî dereng vebûbû. Niha, nedihat bîra Robîn, lê kesê ko derî li wan vekiribû, ne ji mala wan bû. Hindurê xênî tarî bû. Pîrekan her li xwe dixist. Robîn li kesekî jimalê geriyabû. Li hindurê vî xaniyê ko tê de mezin bûbû, berê xwe şaş kiribû. Hema berê xwe dabû odeyekê. Ji wê odeyê jî xwişka wî Mehabad derketibû û çer ko çav li wî ketibû, mîna ko çav li Seydo ketibe, xwe avêtibû stuyê wî û giriyabû. Lê Robîn hey li cihê Seydo pirsîbû. Gava Mehabadê cihê ko pîrek li ser digiriyan nîşan dabû, Robîn tavilê berê xwe dabû wira. Pîrekan xwe ji ber wî dabû alî. Bi vî awayî xwe

gihandibû meytê birayê xwe. Qeweta Mehabadê têrê nekiribû ko wî zeft bike û rawestîne.
Meytê Seydo li ser textê yanê hatibû dirêjkirin. Ser wî jî bi betaniyekê hatibû nixumandin. Pîrekan hey li xwe dixist, diqîriyan û dûrik diavêtin ser wî. Gava Robîn çav lê ketibû, di nav wê qelebalixiyê de, mîna ko mirov ew dabe cereyanê, lerizîbû û şûşî erdê bûbû.

Çavên xwe li hewşa dawiyê vekiribûn. Mîtanî û Mehabadê av li serê wî dikir. Mîtanî hê teva atlêt û bêceme bû. Ji cerga ko meyt anîbû malê, derfet nedîtibû ko tiştekî li xwe bike. Ew jî bi dengên silehan beziyabû derve. Seydo hê nû ji malê derketibû. Tirs ketibû dilê wî. Çongên wî sist bûbûn. Heta ko xwe gihandibû cihê bûyerê, ji meytê birayê xwe pê ve tu tişt nedîtibû.

Yên ko deng bihîstibû, ji malên xwe derketibûn û hatibûn wira. Hişê Mîtanî ji serê wî çûbû. Çavên wî hew mabûn ko ji serê wî baz bidana. Ji xwe, piştî dîtina wî ya Seydo ya di wê rewşê de, heta ko Robîn hatibû jî ne peyivîbû, ne jî giriyabû. Bi çavên vala her li dora xwe niherîbû.

Niha jî Robîn ketibû şûna wî. Birayekî wî hatibû kuştin û meytê wî li hindur bû, yê din jî di destê wî de bû û bêhiş ketibû. Gotibû qey ew ê jî bimire û hindik maye di nav lepên wî de can bide. Ji ber wê, him av li ser û çavên Robîn kiribû, him jî giriyabû. Gava Robîn çavên xwe vekiribûn, giriyê Mîtanî hê jî dewam kiribû. Wan Robîn rakiribû û li ser kursiyekê dabû rûniştandin. Mîtanî Robîn himbêz kiribû û hêsir bi ser de barandibûn.

Di hewşê de, zilamekî birîh hebû ko li ser tifikê, di sîtilekê de av dikeland. Heta ko textek li hewşê dananî û bi dû re meytê Seydo li ser venexist jî Robîn û Mîtanî li sedema kelandina wê avê hay nebûbûn. Zilamên ko meyt anî û li ser text vexist jî li hebûna wan hay nebûbûn. Gava betanî ji ser meyt rakiribû û laşê wî yê spîboz derketibû ortê, bi qêrîna Robîn, li wan hay bûbûn. Wan wê gavê, ser meyt bi lez dîsa nixumandibû û ketibûn bin çengên herdu birayan û ew derxistibûn derve. Qêrînên Robîn yên ko ew ê bibûna sedema ketina dengê wî, dilên hemû kesên li wira bûn, lerizandibûn. Herdu jî mîna zarokan, belkî jî ji zarokan xerabtir, giriyabûn.

Li ber deriyê hewşê, diya wan Leyla Xanimê porê xwe kişandibû, ruyê

xwe bi neynûkan çirandibû, herdu destên xwe ber bi jorê ve rakiribû û qêriyabû. Herçî Robîn û Mîtanî bû, gava ko çav li wê rewşa diya xwe ketibûn, weke ko şerm kiribûn, serên xwe bera ber xwe dabûn û bi ser
26

hevdu de giriyabûn.
Leyla Xanima ko ruyê wê tije qeremûşk bûbû û ji ber kuştina Seydo ji ser hişê xwe ve çûbû, gava çav li wan ketibû, li wan zivirîbû û qêriyabû:
— Divê hûn agir bi vî bajarî bixin! Divê hûn agir bi Diyarbekirê bixin! Divê hûn heyfa Seydo hilînin! Hûn ê serên xwe rakin û bibêjin ko em kurê Leyla Xanima diya Seydo ne, em ê agir bi vî bajarî bixin, yan na ez şîrê li we helal nakim! Hema Seydo miriye, hûn jî bimirin!
Hey digot »haho!« û li xwe dixist. Mirov digot qey yên ko li hember wê bûn, ne zarokên wê bûn. Gava bi wan re peyivîbû, hê jî dev ji qeremûşkavêtina ruyê xwe bernedabû. Porê xwe jî bi hêrs ji kokê rakiribû. Leyla Xanim di xwînê de mabû. Xwîna wê û ya Seydo tev li hev bûbû û li kirasê wê belav bûbû. Xelkê gişî li wê niherîbû. Dilên wan jî bi wê û zarokên wê şewitîbûn û gelek ji wan di ber xwe de, bi dizî giriyabûn. Ew roj û ew rewşa diya wî ya wê rojê, dê tu carî ji bîra Robîn derneketa.
6. Xewn giş dibin kabûs...
Robîn rabû çû ber lawaboyê, da ko ser û çavên xwe bişo. Di neynikê re li xwe niherî. Porê wî tev li hev bûbû. Weke ko ne li xwe binere, lê li yekî xerîb binere, bala xwe baş da wî kesê di neynikê de. Li çavên wî niherî. Giriyê wî û psîkolojiya wî ya roja kuştina birayê wî, anî ber çavên xwe. Bi herdu destên xwe ve, hişk bi lawaboyê girt û diranên xwe pê re şidandin. Kîna dilê wî dîsa hestên wî li bin guhê hev xistin. Weke ko ji hinekan xeyidîbe û hêrs bûbe, serê xwe bera jêrê da.
Bîstikekê sekinî. Kanî vekir, destên xwe dan ber avê. Hinek av li ruyê

xwe kir û şuşt. Bi dû re, destên xwe dîsa şil kirin û di porê xwe de dan, porê xwe bi paş de rast kir. Dîsa li neynikê niherî. Bala xwe da rîha xwe ya sêrokî. Destê xwe li ser ruyê xwe gerand û bala xwe da çavên kesê di neynikê de li hember wî sekinîbû. Di çavên wî de, li xwe niherî. Dilê xwe bi xwe şewitand.
Rahişt destmalê û çû hêwanê. Ji aliyekî ve jî dest û ruyê xwe zuha dikirin. Rahişt berçavka xwe û got:
— Roj baş.
Herkesî li dora sifrê, ji xwe re cihek zeft kiribû. Ji ber ko roja yekşemê bû, Mîtanî û Mehabad jî îroj neçûbûn kar. Mêvan jî hebû. Ji ber wê, ser sifrê qelebalix bû. Robîn jî hema xwe di cihekî de rakir û rûnişt. Hê ji tesîra wê xewnê û fikrên ko di pey wê re hatibûn û ew di nav xwe de veg-

evizandibû xelas nebûbû. Êdî li kû derê binihériya, li kê binihériya, ew roj dihat bîra wî. Ji ber wê jî hew dikarîbû li nên bifikiriya. Tiştek nedixwar. Vê yekê bala yên dora wî jî kişandibû.
Piştî taştê, sifre hat hilanîn û herkes ber bi cihekî ve vekişiya. Serdar û Meryemê di televîzyonê de li filîmekî temaşe dikir. Herçî filîm bû, li ser lawikekî deh-duwanzdeh salî û kûçikê wî yê biaqil bû. Resûl Begê bavê wan jî xwe dabû kêleka wan û bi wan re li filîm temaşe dikir.
Leyla Xanim jî çû fêkî anî û hat li cem yên din rûnişt. Mehabadê li medbexê firax dişuştin. Jina Mîtanî jî ketibû odeka xwe, li ber neynika xwe rûniştibû û meqyaja xwe dikir. Mehabad ji van tevgerên wê, ne razî bû. Ji lewre, gava ko sênik datanîn ser hev, dikir ko deng ji wan derkeve û biçe wê, da ko bûk li ber xwe bikeve. Karê wan ê herroj ev bû.
Qîzên malê û bûkê li hev nedikir. Gava yekê ji wan, xwe bi tiştekî bişi-

texilandaya, ya din tavilê gir ji wê digirt û wê jî tu kar nedikir. Heke dikir jî beyî dilê xwe dikir û pir deng derdixist. Wan bi vî awayî, hêrsa xwe nîşan dida û dilê wan rehet dibû.
Robîn çixareyek pêxist û yek jî da Bedirxên. Mîtanî weke hercar, çixareya xwe berî herkesî pêxistibû. Wan ji hev re behsa karên xwe dikir. Robîn jî di ser situyê xwe re zivirîbû û di pencereyê re li derve diniherî. Ji kolanê dengê mekîneyan dihat. Keçikek û xortek, destên wan di hev de dimeşiyan. Li nav hêşinahiya ko li wî aliyê riyê bû, du-sê zarokan ji xwe re bi navê dilîst. Rojê tîrêjên ko çavên mirov jê biêşin li der û dorê belav dikirin.
Çivîkek hat û xwe li perpaza pencereyê danî. Robîn bala xwe da wê. Çivîkeke xweşik û piçûk bû. Çavên xwe yên mîna deqekê li dora xwe di-gerandin. Kêfa Robîn ji wê re hat. Xwast pencereyê veke, wê bigire û bîne hindur. Lê belê, hê ew li ser vê fikrê bû, çivîk firiya û çû. Çivîkeke din jî hat û herduyan xwe gihand hevdu. Li hewa, xwe teqil kir û li dora hev çûn û hatin. Bi dû re jî li pey hev bi dûr ketin û wenda bûn. Hişê wî jî bi wan çivîkan re çû.
Li hêwanê, bi hatina Mîtanî re li xwe zivirî. Wî nedîtibû ko Mîtanî ji cem wî rabûbû jî. Mîtanî kincên xwe li xwe kiribûn û ji bo çûyinê xwe amade dikir. Bedirxan jî rabû ser xwe û li wî niherî. Robîn nedixwast derkeve derve. Nedixwast li malê jî bimîne. Nema dizanîbû bê çi dixwaze. Lê divê biryarek bidaya. Li ser herdu alternatîfan jî biryareke li gora dilê xwe neda. Dît ko Bedirxan jî israr dike, ew neşikenand û çû kincên xwe bi awayekî bêdilî xwe li xwe kirin û bi wan re derket.
28

Dinya germ bû. Roja yekşemê, ji bo kesên ko li bajarekî mezin dijîn, ne

roja kar bû. Piraniya kesan, wê roja xweş a betlanê, yan bi serîlêdana heval
û hogiran, yan jî mîna wan bi seyranê derbas dikir. Tew heke bajarê ko ew lê dijîn, bajarekî dîrokî, xwedî kolan û avahiyên egzotîk û sûkên mezin be ko mirov tê de dikare wenda bibe... Bi ser de jî li kêleka behrê be… Mirov rojê li kolanekê, li sûkekê, li taxekê bigeriya jî nikarîbû ji vî bajarî têr bibûya. Li vî bajarê kevnare, di binê her kevirekî de, tiştekî esrarengîz hebû. Dîrok û nûjenî bi lihevkirineke ecêb di hindurê wî de dijîn ko hişê mirov nagihêjê û meraqa mirov pirtir dike.
Vî bajarê ko di dema xwe de, gelek siltan û împaratorên mezin, gelek alim û edîb, gelek leheng û mêrxas dîtine… Vê devera ko bi efsaneyên xwe yên ko hê jî nehatine jibîrkirin, bi şerên xwe yên li ser desthilatdariyê, bi dek û dolab û fesadî û bêbextiyên xwe yên ko bûne sedema kuştina gelek kesên bêguneh û bêsûc, bi entrîqayên xwe yên ko li serayên siltanên
Osmaniyan û qesr û qonaxên ko nêzîkî wan hatine gerandin û bûne sedema perçebûyin û jiholêrabûna împaratoriyeke ko li çar aliyên dinyayê xof bera dilê gelek hikumdarên din dabû… Vî cih û warê fermanan, fermanên ko bûne sedemên talankirin, sirgûnkirin û tunekirina mirov û medeniyetên cida… Bajarê ko piştî ewqas sal û ewqas guhertinan, hê jî bi qasî ko mirov li xwe ecêbmayî bihêle, mezin û xwediyê bedewiyeke efsûnî... Ew bi her avahiyeke xwe ya dîrokî, ji hemû bajarên din cidatir e. Her niherînek meraqeke nû dixe dilê mirovan. Ev deverên weha ne ko xweziya mirov bi zemanên berê tîne.
Rojên betlanê, rojên gerê û kêfê bûn. Niha perav, park, qafeterya, sûk û sînemayên bajêr tije bûne. Kolan û kuçeyên wî bûne cihên gerê. Li ser pireyên wî yên dîrokî, masîgirên ko şewk di destên wan de, bi destê sîbehê re şûna xwe zeft kiriye... Keç û xortan ji rojên din bêtir xwe xemi-

landiye û derketine derve.
Mîtanî, Bedirxan û Robîn ji bo ko mîna herkesî xwe bigihîne cihekî gerê, li otobusa belediyeyê siwar dibûn. Mîtanî sê bilêt avêtin qutîka li ber
şifêr. Çavên şifêr heta ko wî bilet avêtinê, li qutîkê bûn. Bi dû re, pê li bişkoka derî kir û derî bi gurmîniyeke mezin hatin girtin û otobus meşiya. Şifêr carê di neynika hember xwe re li rêwiyan diniherî. Çavên wî carê diçûn ser neynikê û diçûn ser riyê.
Ji ber ko cihên din giş tije bûn, hersê çûn û li ser paldankên dawiyê rûniştin. Ji xwe, paldankên dawiyê, bi dilê Robîn jî bûn. Ew kengî li mekîneyekê siwar bibûya, berê bala xwe dida paldankên dawiyê. Ji ber ko
29
REŞ Û SPÎ

gava mirov li pêşiyê rûdinişt tu tişt nedidît, wî tu carî dil tune bû ko li wira rûne.
Mîtanî û Bedirxan dîsa ketibûn peyvê. Di nav re carinan li Robîn dini-herî. Robîn jî ji xwe re li rêwiyan diniherî. Ji her celebî însan hebûn. Herkê tiştek dikir. Yên di xew re diçûn, yên behsa maçên fûtbolê dikir, yên pirtûk dixwendin, yên di camê re li derve temaşe dikir, yên bi derdên xwe biliyabûn û diponijîn û yên mîna Robîn li dora xwe temaşe dikir…
Xortekî serê xwe bera ber xwe dabû û pirtûka ko danîbû ser çongên xwe dixwend. Robîn ew lawikê ko porê wî tim bela wela bû, nas dikir. Ji ber ko gelek caran di otobusê de, ew bi vî awayî didît. Ji wî bi wê de, yekî din rojnameyeke sporê dixwend. Dengê kesên ko bi hev re dipeyivîn tev li hev dibûn û di hindur otobusê de belav dibû.
Xortê ko pirtûk dixwend, pelek ji pirtûka xwe zivirand, serê xwe rakir

û weke ko bixwaze têbigihêje, bê hatine kî derê, li dora xwe niherî. Bi dû re, dîsa berê xwe da pirtûka xwe. Keçikek li paş wî rûniştibû. Robîn ev keçik jî gelek caran dîtibû. Mala keçikê nêzîkî ya wan bû. Carinan, gava Serdar ne li malê bûya û bi xwe diçû ji xwe re rojnameyê bikire, wî ew keçik li der û dora sîteya xwe didît.
Ji bo ko balê bikişîne ser xwe, keçikê carê porê xwe girê dida û vedikir. Çi hunerên wê hebûna, giş pêşkêş dikirin. Çavên hemû xortên li dora wê, dageriyabûn ser wê. Xortekî bîst- bîst û pênc salî, li ser serê wê sekinîbû û
ziq li wê diniherî. Keçikê qutikekî belek li xwe kiribû. Herdu aliyên qutikê xwe li ser nava xwe bi hev ve girê dabûn. Pêsîrdankê wê yê reş û serên çiçikên wê di bin qutikî re xuya dibûn. Bi xêra etegê wê yê kin û fireh, çîpên wê yên xweşik li derve diman. Ev taybetiyên wê, ji bo ko bala xortan bikişîne, bes bûn.
Lêwik niherînên xwe yên mestbûyî ji sînga wê daxistin ser çîpên wê. Hişê wî ji serê wî çûbû. Niherîneke wî ya ecêb hebû, mirov digot qey dike xwe bi ser keçikê de biavêje. Piştî ko keçikê dît, du-sê xortikên din jî bala xwe daye wê, ji qazî, mîna ko aciz bûbe, kir ufe uf û bi awirên tûj li dora xwe belav kirin. Her ko keçikê weha dikir, xortên ko li wê diniherîn, diketin ber fediyê, mîna ko sûcekî veşêrin ruyê wan sor dibû û berên xwe diguhertin.
Di hindurê otobusê de, bêhna parfumên cida cida û xwêdanê tev li hev bûbûn. Germeke weha hebû ko mirov difetisand. Digel ko hemû pencereyên otobusê vekirîbûn jî ji bayekî qels pê ve hewa nedihat hindurê wê.
30

Otobusê xwe bera ser riya jêrê da. Lawikê ko pirtûk dixwend, serê xwe

dîsa rakir, li dora xwe niherî, pirtûka xwe bi lez girt û rabû ser xwe. Çû li ber deriyê ortê sekinî û pê li bişkoka derî kir. Lempeya piçûk ya li ser derî vêket, otobus li rawestgehê sekinî û deriyên wê vebûn. Gava ko lawik daket, çend kesên din di deriyê pêşiyê re siwar bûn. Bi dû re, derî dîsa hatin girtin û otobus meşiya.
Robîn bala xwe bîstikekê da Mîtanî û Bedirxên jî. Herdu hey li ser karên xwe dipeyivîn. Tew gava Mîtanî dipeyivî, mirov digot qey ji wî pê ve, tu kes nikare wî karî mîna wî bimeşîne. Herçî Mîtanî bû, gava diket peyvê, tew ko mijar li ser karê wî bûya, kesî hew dikaribû ew bisekinan-da.
Mîtanî mîna hercar, rîha xwe kur kiribû û ruyê wî spîboz dibiriqand.
Bi simbêlên wî yên reş û ziravik û porê wî yê kin ko temberiya wî hertim di kêlekê de vekirî bû, Robîn ew her dişiband şoreşgerên salên heftêyî. Wî
ew dem hew ji pirtûkan û vegotinên ko ji wî re hatibûn kirin, dizanîbû û ew kes jî ji wêneyan nas dikirin. Ji tiştê ko ji wan di bîra wî de mabû, yê herî balkêş ew bû ko hemû şoreşgerên wê demê dişibiyan hevdu. Mirov digot qey gişan bi hevdu re biryar dabû ko kincên mîna hevdu li xwe bikin û rîha xwe û porê xwe mîna hevdu şeh bikin, simbêlên xwe jî heta ser lêva jêrê berdin.
Keçik rabû ser xwe û ber bi deriyê dawiyê ve hat. Robîn ji qazî, berê xwe da aliyê din. Keçikê heta ko Robîn li wê niherî, li wî niherî û ji bo ko bala wî bikişîne, hêdî hêdî bi porê xwe lîst û bi delalî bişirî.
Carekê, Robîn jî serê xwe rakir û li ruyê wê yê esmer î xweşik niherî. Niherîna wî bala keçikê jî kişandibû. Keçik jî ji bo ko hebekî din bala wî bikişîne ser xwe, daqûl bû û toza li ser sola xwe bi tiliyên xwe yên nazik paqij kir. Gava daqûl bû, bala Robîn beyî îradeya wî, çû ser memikên wê yên nermik ko zor didan pêsîrdankan û her ko diliviyan xweşiktir dibûn

û tevzînok bi dilê yê ko bala xwe dida wan dixistin. Robîn jî gava li wan memikên xwêdayî yên li ser sîngeke gewr û nerm niherî, hema tu nemabû ko xwe biavêjê himbêza wê. Tevzînokên germ xwe li wî girtin û xwedanê di canê wî re avêt. Gava ko keçikê serê xwe rakir, wî bi lez berê xwe guhert. Ji ber ko hayê keçikê ji wî çêbûbû, ket ber fediyê.
Keçika ko porê xwe bi hereketeke nazik ko ew ê bi dû re ji Robîn re bibûya derdekî bêderman û her di bîra wî de bimaya, avêt paş situyê xwe, ji kêlekê de di bin mijangên xwe yên dirêj re li wî niherî. Bişirandineke ko di bedewbûna wê de roleke mezin dilîst, di bin wê bêvila zirav û piçekî

31

REŞ Û SPÎ

ber bi jorê de rakirî de, ji nav lêvên wê yên xweşik ên ko mirov hema dixwast têxe devê xwe û bimêje, xwe li ruyê wê belav kir. Wê gavê, Robîn beyî bizanibe ko ev niherîn dê wî bike hêsîrê xwe, berê xwe da wê û weke ko tê de wenda bibe, li wan çavên efsûnker niherî. Keçikê jî berê xwe ji wî
nedida alî. Heta ko otobus sekinî, weha ma. Bi sekinandina otobusê re deriyên wê bi gurmîneyekê vebûn û keçik daket.
Derî dîsa bi eynî gurmîniyê hatin girtin û otobus meşiya. Robîn di camê re li meşa keçikê niherî. Bala xwe da bejina wê ya zirav. Bi dû re ke-serek kişand û di dilê xwe de got:
— Xwezî yarê, tu ya min ba…
Ji rawestgeha ko keçika xweşik daket, keçikeke din siwar bû. Lê li gora ya din, pir cida bû. Serê wê nixumandî û canê wê heta zendê girtî bû. Meşeke wê ya bi bixwebawer hebû. Robîn her ko yeka weha didît, li vê dinyaya dualî ecêbmayî dima.
Piştî bîstikekê, mekîneyê xwe da kêleka riyê û hemû deriyên wê vebûn.

Piraniya kesên ko ji mekîneyê dadiketin, xwe ji mekîneyên din bi zorê xe-
las dikir û derbasî aliyê din î riyê dibûn. Ji aliyê riyê yî din, dengê qele-
balixiya kolana Îstiklalê dihat. Ev kolan yek ji wan kolanên kevintirîn ên
vî bajarê mezin bû û tim û daîm tije bû. Di orta wê re tramwayeke nos-
taljîk derbas dibû û dikir ko dîrokîbûna vî bajarî baştir were bîra mirov.
Gava bi gelek kesên din re derbasî aliyê kolana Istiklalê bûn, berê,
Meydana Taksîmê ya fireh ko bûye cihê gelek çalakiyên hêzên mixalif
xuya bû û bi dû re jî di nav şênkahiya dorpêçkirî de li ser abîdeyeke gewr,
peykerekî reş û bilind hat pêşiya wan. Di wî pêykerî de, li pêşiyê sê-çar zil-
am diyar bûn. Li dû wan jî çend pîrek hebûn ko ruyên wan zelal nedi-
hatin dîtin. Gişan dabû pey zilamekî ko gava xwe diavêt û ji kincên wî di-
yar dibû ko fermandarekî leşkerî bû. Li herçar aliyê vê abîdeyê, peykerin
leşkeran mîna yê pêşiyê hatibûn danîn. Li aliyekî wî jî di nav du leşkeran
de, mîtralyozek xuya dibû ko ji bo nîşandana dîroka vî welatî hatibû
çêkirin.
Robîn bala xwe dabû vê abîdeya ko gelek caran di televîzyonê de
derdiket. Bîstikekê lê temaşe kir û ji bo ko têbigihîje, bê ka ev abîde
dixwaze çi bibêje, fikirî. Digel ko heta niha gelek carî di ber vê abîdeyê re
bihurîbû, tu carî li tiştekî weha nefikirîbû. Ew jî li vê yekê hay bû û dev ji
vê fikra xwe berda. Bi dû re li dora xwe zivirî û çavên xwe li Mîtanî û
Bedirxên gerandin. Lê belê, tu kes li dora wî tune bûn.
Li aliyê kolanê niherî. Ew kolana ko bîstika din cihê meşê tê de tune bû,
32

vala xuya dibû. Ne tu kes diçû û ne jî dihat. Ji der û dorê, tu deng jî nedi-
hat. Wê gavê, Robîn valahiyek di dilê xwe de his kir. Tirsiya. Weke ko
kabûsek dîtibe, çavên xwe bi tirs girtin û vekirin. Bayekî tenik hat û xwe

li wî xist. Dîsa li dora xwe niherî. Kolan, rê û park- markên der û dorê, hindurê bufeyan, ber qulubeyên telefonê, meydan, kevirên dora meydanê ko kesên diwestiyan li ser rûdiniştin û li dora xwe diniherîn, kuçeyên ko derdiketin kolanê… Giş vala bûbûn. Û li wê derê pêjina însanekî jî nedihat.
Robîn bêtir tirsiya. Valahiya dilê wî mezintir bû. Meraq û tirs û heyecan di dilê wî de tev li hev bûn. Ecêbmayî mabû. Bêhna wî dikira biçikiya. Serê wî gêj bû. Tu nema bû ko ji tirsa biketa û bimira.
Beyî hişê xwe meşiya û hat ber kaniya piçûk ko şênkahiya li dora abîdeyê av dida. Destên xwe dan ber û tije kirin. Bi dû re jî ava di kefa destê xwe de girtibû, bi hêviya ko ji vî kabûsî şiyar bibe, bi şerpîniyekê li ruyê xwe kir. Careke din weha kir. Serê xwe da ber kaniyê û li ava ko li ber çavên wî diherikî erdê temaşe kir. Bi dû re, serê xwe yê ko av jê diniqutî rakir û ew tirs dîsa di dilê xwe de his kir. Wê gavê, mîna ko tiştin ji hindurê wî ji hev biqetin û jana xwe bidin der, rengê ruyê wî hat guhertin û çavên xwe bi kerb bi awayekî acizbûyî birin ser hev.
Her der mîna ko di tabloyeke bêînsan be, vala bû. Tu deng jî tune bû. Çû destê xwe li cama dikanekê xist. Serê xwe bir ber camê. Ji ber ko şewqa
rojê dida camê, destê xwe ji xwe re kir sî û bala xwe da hindurê dikanê. Hindurê wê tarî bû û tu kes jî tê de tune bû. Zivirî, berê xwe da kolana Istiklalê û beyî ko bizanibe, bê ew ê çi were serê wî, meşiya.
Kolan bi rastî jî vala bû. Digot qey aniha ew ê hinek ji kuçeyekê derkevin û ji wî re bibêjin »henek bû« û bi wî bikenin, yan jî wî bitirsînin. Ew dikana ko hertim dengê muzîkê jê dihat jî girtî bû. Heta ber Lîseya Galatasarayê, hey çavên xwe digerandin û di her kuçeya ko dihat ber wî re serê xwe dirêj dikir û diniherî. Her gava didît ko her dever vala ye, bêhtir ditirsiya û bêhna wî diçikiya.

Bayek hat û porê wî li nav hev xist. Di pey wî re, şerqîniyek ji ezmên hat û baranê dest pê kir. Robîn di cihê xwe de sar mabû. Weke ko dixwast mahneyekê bide vê rewşê, bi çavên tijî meraq, li bûyerên ko diqewimîn diniherî.
Heyirîbû. Xwe ji ber baranê neda alî. Baran weke ko ji wî re bibêje »xwe ji ber min bide alî, bicehime biçe!« her ko çû, xurttir bû û der û dor di nav avê de hişt.

33

REŞ Û SPÎ

Kincên wî giş şil bûbûn. Berê, milên wî, bi dû re jî hemû laşê wî di nav avê de ma. Ser û çavê wî şil û pil bûbû. Ji ber ko berçavka wî jî di nav avê de mabû, hew dikarîbû tiştek bidîta. Berçavka xwe derixist û xist bêrîka xwe.
Kolan di nav avê de mabû. Av di bin lingên wî re diherikî. Dengê xuşiniya avê, ji bo ko mirov hêza vê tofanê fahm bike, bes bû.
Ji nişka ve, dengê şerpe şerpa lingekî din ji paş wî hat wî. Gava deng seh kir, veciniqî û bi tirs li xwe zivirî. Yek di bin baranê de, ber bi wî ve direviya.
Xortekî dirêj bû. Ji bo ko xwe ji peşkên avê biparêze, gavên xwe fireh diavêtin û bi serê tiliyan pê li erdê dikir û dihat. Ew jî di nav avê de mabû. Pirtûka di destê xwe de li ser serê xwe digirt û direviya. Gava ko Robîn çav li pirtûka wî ket, tiştên di derheqa lêwik de, di serê wî de zelal bûn. Robîn ew nas dikir. Ev lawik, ew xort bû ko di otobusê de pirtûk dixwend.
Lawik ji nişka ve çav li Robîn ket û ew jî mîna wî veciniqî. Bîstikekê li şûna xwe sekinî û bala xwe da wî. Bi dû re hat û li ber wî rawestiya. Weke ko hevdu nas dikin, dest bi peyvê kir:

— Ji bo Xwedê, ev çi ye?
Robîn jî beyî ko bersivekê bidiyê, li wî diniherî. Bi dû re, têgihişt ko herdu jî eynî tiştî meraq dikin. Lêwik vê carê, bi awayekî hêrsbûyî pirsî:
— Ma çima tu bi min re napeyivî?
Di bin wê barana xurt de, ji bo ko dengê xwe bigihîne Robîn, bi dengekî pir bilind dipeyivî. Hê nû hat bîra Robîn ko diviyabû bersivek bidaya wî. Wî jî weke ko ji berê de wî nas dike bersiva wî da:
— Ez jî nizanim. Birayê min û hevalekî me bi min re bûn. Ez niha nizanim bê bi kû de wenda bûne.
Mîna ko şerekî mezin li dora wan çêbûbû, lê ew nuh lê hay dibûn, li hevdu diniherî. Herduyan jî nizanîbû ko ew ê bi dû re hevdu gelek caran di rewşên weha de bibînin û ew ê bibin hevalên hev. Robîn dikarîbû texmîn bikira ko belaya li ser serê wan, yek e, lê nikarîbû nav lê bikira. Nepeyivîn. Lêwik berê xwe bi jorê ve kir û li ezmên niherî. Baran. Hêrs. Lê piştî çend saniye derbas bûn, herduyan ji nişka ve li pey hev baz da û xwe ji ber baranê da alî. Hatin ber dikanekê. Lêwik lingê xwe rakir û pi-hînek li camê xist.
— Xwe bide alî!
Bi pihîna wî re, şerqînî ji camê hatibû û perçeyên cama şikestî li erdê
34

belav bûbûn. Li pey hev ketin hindurê dikanê. Herçî dikan bû, bi qasî su-permarketekê mezin bû û li ser refikên wê, hertişt hebû. Hindur tarî bû. Ji alavên wê bêhneke xweş dihat. Di gel ko wan dizanîbû, ew ê nikaribin tiştekî bibînin jî di hindurê dikanê de li xwediyê wê geriyan. Dîsa veg-eriyan ber cama şikestî. Lêwik serê xwe derixist û li derve niherî.
Baran hê jî dibariya. Tiştekî nû tune bû. Kolan hê vala bû. Bîstikekê li valahiya wê niherî, bi dû re dîsa serê xwe kişand hindur.

Hêrsa wî xwe ji ruyê wî dida der. Awirên wî tûjtir bûbûn. Destên xwe dan kulêmekên xwe û mîna ko hinekan ew kêr kiribe, serê xwe bi kerb kil kir. Robîn digel ko lêwik ji wî re tiştek negot jî bi awayekî ko ew ê bi dû re, bi xwe lê ecêbmayî bimaya, ji niherînên wî tê derxist bê li derve çi dîtibû. Herduyan jî serên xwe bera ber xwe dan û li hember hev rûniştin. Robîn pakêta xwe ya çixareyê ji bêrîka xwe derixist û lê niherî. Pakêta wî jî ji baranê qismetê xwe stendibû. Hêvî tê de nemabû, şil û pil bûbû. Ji neçarî, çavên xwe li refikên dîwêr gerandin. Çû û pakêtek ji ser refika çixareyan anî. Gavekê, rewşa xwe ji bîr kir û destê xwe ji adetî avêt bêrîka xwe, da ko pereyan derxîne. Ji nişka ve, li xwe hay bû û bi halê xwe keniya. Bi dû re, dîsa ji kerban, lêva xwe gez kir.
Lêwik careke din li derve niherî. Kes tune bû. Vê carê jî tiştek ji Robîn re negotibû û Robîn weke cara din ji niherînên wî fahm kiribû. Lawik hat û li şûna xwe rûnişt. Li Robîn niherî. Çavên wî sor bûbûn. Ji hêrsa xwe, dikira biteqiya.
— Hela ka çixareyakê bide min jî.
Wî jî çixareyek pêxist. Herduyan jî dîsa serên xwe bera ber xwe dan. Lêwik bê deng dest bi girî kir. Milên wî diricifîn û carê bêvila xwe dik-işand. Robîn ranebû û neçû ba wî. Lê hey li wî temaşe kir. Dizanîbû ko ev jî mîna yên din xewnek e û gava dema wê bihataya, ew ê jî biqediya. Lawik têra xwe giriya. Lê ji ber ko ji Robîn şerm dikir, pir hewil dida xwe ko dengê giriyê wî neçe Robîn. Lê belê, çi qasî hewil dida xwe jî Robîn dîsa bi giriyê wî dihisiya. Bi dû re, wî ê ji Robîn re bigotaya:
— Heke ez negiriyama, ez ê biteqiyama.
Gavekê, çavên wî yên sorbûyî, ber bi cama şikestî ve dageriyan. Dengê baranê hew dihat. Lê hay bû ko gava ew digiriya, baran sekinîbû. Wê gavê, herdu rabûn ser xwe û derketin derve. Kolan dîsa vala bû. Vê carê, Robîn jî kelogirî bûbû. Çavên wî hêdî hêdî tije dibûn. Dilên wan careke

din şikestibûn. Mirov digot qey, herkes li keştiyekê siwar bûye û keştiyê daye nava behreke dadayî û çûye, an jî gava gihîştiye okyanûsekê, ser-
35
REŞ Û SPÎ

obinî bûye û ketiye binê avê û wenda bûye. Û bi tenê ew herdu ne di wê keştiyê de bûn.
Çavên herduyan jî werimîbûn. Bi tenê bûn. Wan hevdu baş nas nedikir, lê herduyan jî weke ko ev ji hevdu vedişart hereket dikir. Rabûn û ji bo ko li deverin din jî li hinekan bigerin, meşiyan. Kolan mîna ko hat-ibe şuştin, paqij bûbû. Bayekî hênik dihat. Ji ser banên avahiyan av di-herikî. Ezman mîna ko xwe bi barana xwe şuştibe û xwe ji gemarê daweşandibe, dibiriqand. Kincên Robîn û lawikê ko ew ê Robîn bi dû re hîn bibûya ko navê wî Bişar e, hê zuha nebûbûn.
Bi şev jî nesekinîn. Bê serî li pey şopa însanên din geriyan. Di nav tariyê de û li bajarekî ko mirov digot qey navendên wî yên elektirîkê giş teqiyane û îflas kirine, ji kuçeyekê diketin kuçeyeke din, ji malekê diketin maleke din û diwestiyan. Nedixwastin rûnin. Mirov digot qey herkes ji ber wan direve. Li her deverê geriyan. Li her devera ko wan dikarîbû xwe bigihandayê...
Her ko ji maleke vala derdiketin, situyên wan xwartir dibûn. Pişta wan xûztir, qermîçokên dora çavên wan û eniya wan kûrtir dibûn. Gavên wan jî sisttir dibûn. Ji taqetê diketin. Hêviya dilê wan a ji bo dîtina hin kesên din, qelstir dibû û bitenêtî û aciziya wan jî pirtir dibûn. Êdî wan fahm kiribû. Ne bi dilê wan bûya jî li vî bajarî ji wan pê ve tu kes tune bû...
Robîn ê bi dû re ji xwe re bigotaya:
— Min tu carî kabûsekî weha nedîtibû ko wexteke ewqasî dirêj ajotibe. Min digot qey ew ê bêhna min biçike, ez ê tê de bigevizim û bifetisim. Lê

piştî wê xewnê, ez têgihiştim ko di kabûsekî de, ji derveyî mirov tu kes nikare alîkariya mirov bike. Ji ber ko ji derveyî mirov, tu kesekî din di wî kabûsî de tune ye. Yên hebin jî bi tenê dikarin tirsa wî kabûsî hebekî din mezintir bikin.
Wî ê bigotaya:
— Mirov dizane ko ev xewn e, lê mirov nizane, bê çawa dibe.
Û wî ê bigotaya:
— Herkes xewnên xweş dibînin, xewnê herkesî li gora dilên wan in; lê ez her kabûsan dibînim.
Herduyan Stenbol li bin guhê hevdu xist, dîsa tu tişt nedît. Yan jî gelek tişt dîtin. Pireyên teng û rêyên dirêj ên vala, kuçeyên bêzarok, xaniyên ko hatine terkkirin, wêneyên bêxwedî; nameyên ko hê nehatine xwendin û ew ê tu carî jî neyên xwendin, roman û helbestên nîvcomayî; pêsîr-dankeke ko ji ber lezê, li mala zilamekî azib hatiye jibîrkirin… Fermanên 36

ko bi dizî hatine îmzekirin, fermanên ji bo kuştina gelek kesên navdar; kaniyên kerxaneyan yên vekirîhiştî, cidayetiya di navbêra xaniyên xizanan û dewlemendan de; îşkencexaneyên veşartî, rêyên ko bi tenê mirovên ko ew kolane pê dizanin, rêyên di bin erdê de hatine vekirin û ji bin girtîgehekê derdiketin kêleka behrekê…
Robîn her ko ew tişt bianîna bîra xwe, dê ji xwe re bigotaya:
— Piştî wî kabûsî, ez têgihiştim ko ez bi tu gûyê xwe nizanim.
Pir geriyan. Li şopa tiştekî zindî rast nehatin. Deryaya Marmarayê bê xem diherikî û ava ko ji Deryaya Reş dianî, di ser Egeyê re, di nav bêhna mozaîka gelan û çanda wan ya talankirî re, digihand Deryaya Sipî; deryaya ko gelek şerên giran li ser wê çûbûne û bi dû re jî ji bo wê sitranên herî xweş hatine gotin.

Li ser pireya Boxaîçîyê sekinîn. Westiyabûn. Porên wan tev li hev bûbûn. Rîhên wan dirêj bûbûn. Piştên wan ên xûz û gavên wan ên sist, ew dikirin mîna du kalên sedsalî. Enîşkên xwe danîn ser hesinên pireyê û bi çavên kortçûyî li deryaya bêdawî niherîn.
Bişar beyî ko li Robîn binere, bi dengekî pir bikerb got:
— Kes tune ye…
Û tu tiştekî din ji devê wî derneket. Robîn li Bişêr niherî û wî jî bi kerb got:
— Ka tu dibêjî, em çi bikin?
Gava dipeyivîn dengê wan diricifî. Mirov digot qey ji binê erdê dipeyivîn û gava ko dengê wan derdiket ser ruyê erdê, bayekî kur lê dix-ist. Çavên Robîn li sînorên deryayê yên bêdawî bûn û li benda bersiva pirsa xwe sekinîbû. Deng ji Bişêr nedihat.
Westiyabû. Hingî westiyabû û aciz bûbû, di xwe re nedidît ko li wî bizivire jî. Heta ko dengê xuşîna avê hatê jî li benda bersivê mabû. Bi dengê ko ji avê hat, li xwe zivirî û dît ko Bişar ne li şûna xwe ye. Bi lezekê li dû xwe zivirî û çavên xwe li dora xwe gerandin. Bişar wenda bûbû... Berê xwe nedayê û li behrê neniherî. Mîna ko bombeyek di hindurê wî de teqiyabe, dilê wî êşiya. Êdî bi tena serê xwe mabû. Wî xwast ko xwe di pey Bişar re biavêje. Lê, her ko sînga xwe digihand hesinê pireyê, diket dudiliyê. Nizanîbû ji bo çi ye, lê newêrîbû xwe bikuşta. Cesaret nekir. Destê xwe kir hutik û ji kerban, bi hemû qeweta xwe ve hişka li hesinî xist. Dengekî xurt ji hesinî derket û di hesinên din de olan da.
Serê wî gêj bû, lê zû hat ser xwe. Kela girî xwe li qirika wî girt. Qerisî. Çîpên wî hew dikarîbû giraniya laşê wî hilgirta. Gêjbûna serê wî bêtir bû.
37
REŞ Û SPÎ

Ber çavên wî reş bû. Rengê ruyê wî pê re hat guhertin. Çongên wî ji xwe-ber fisiyan. Gava çongên wî difisiyan, herdu destên wî bi kêleka wî de ketibûn. Hemû laşê wî, bi carekê di nav êşekê de gevizî û li erdê ket. Xwîna wî hew herikî. Çavên wî hatin girtin.
Bi dû re, wî ê li ser vê bûyerê, ji xwe re bigota.
— Min got qey ez bi rastî jî mirime.
Bi ketina wî ya erdê re, hemû mirovên li wê dorê, weke ko li tiştekî nedîtî rast hatibin, li ser serê wî civiyan û di nav xwe de her peyivîn. Heryekî li gora xwe behsa sedema ketina Robîn dikir. Qelebalixiya ko li dora wî diciviya, her ko diçû mezintir dibû. Mîtanî û Bedirxan ecêbmayî mabûn û li Robînê ko di nav destê wan de, ji nişka ve ketibû erdê û bêhiş ketibû, diniherî. Tiştekî weha tu carî nehatibû serê wan. Mirov digot qey dest û lingên wan hatibûn girêdan, serên wan gêj bûbûn û bi çavên xwe yên dikira ji serên wan baz bidaya, hey li dora xwe diniherî. Belkî li ruyekî nas ko bikaribe alî wan bike digeriyan, belkî jî li bende bûn ko Robîn bi xwe şiyar bibe. Lê tiştekî din hebû ko ji awirên ewqas însanan aciz bûbûn û hema dixwast zû bi zû Robîn rakin û ji wira bi dûr bikevin.
Yekî digot:
— Avê bînin, avê!
Yekî din digot:
— Erê erê, av baş e. Avê li serê wî bikin!
Dengên niçe niçan û wax waxan tev li hev dibûn û dikir ko Mîtanî û Bedirxan bêtir aciz bibin. Bi dû re, Bedirxan du-sê şîrmaq li Robîn xistin û bi Mîtanî re hey mîna ko ji binê bîreke kûr û tarî bangî wî bikin, bi dengekî bilind navê wî digot. Carekê, mijangên Robîn yên dirêj tev liviyan, bi dû re mîna ko êşeke pir xedar dikişîne çavên xwe hişk girtin. Xwe bi ser kêlekê de qulipand, bi zikê xwe girt û wê gavê, dengê nalîneke kurt ji devê wî hat bihîstin.

Mîtanî û Bedirxan beyî ko zanibin, bê divê çi bikin, serê wî û destên wî mist didan. Bi dû re Bedirxan rabû û ji bo ko qelebalixiya ser serê wî biqewirîne, destên xwe kil kirin û bi wan re xeyidî:
— De vekişin, hela vekişin!
Tu kes venedikişiya. Mirov digot qey wan li filîmekî weha temaşe dikir ko destê wan jê nedibû û ji ber vê yekê, dîsa bi şûn de dihatin. Bedirxên bi awayekî hêrsbûyî çavên xwe girtin, herdu destên xwe rakirin û mîna ko di xortaniya xwe de kiribû, weke pêxwasekî Diyarbekirî, bi tirkî bi dengekî weha qêriya ko kesên dora wî jê tirsiyan.
38

— Açilin laaaan!
Herkesî bi deverekê de baz da û belav bûn. Vê carê jî ji dûranê li wan temaşe dikir. Gava Bedirxên qelebalixiya dora xwe diqewirand, Mîtanî jî bi Robîn girtibû û ew radikir ser piyan. Bi dû re, polîsek hat li ser serê wan sekinî. Mîtanî tişt miştin jê re gotin. Wî jî copê xwe derxist û alî Bedirxên qelebalixî belav kir û çû.
Her yek ketin bin milekî Robîn û ew li kêleka peykêr, li ser kevirekî dan rûniştandin. Mîtanî bi awayekî ko dilê wî bi birayê wî dişewitî, bi heye-can got:
— Çi bi te hat, lawo? Te em tirsandin, ha!
Robîn jî nizanîbû, bê çi hatibû serê wî. Bes dizanîbû ko tiştê hatibû serê wî, ne tiştekî baş bû. Ji lewre, ew jî li hember vê nexweşiya nû, mîna yekî ko cinawireke mirovxwir dîtibe û ji tirsa lal bûbe, bi çavên xwe yên tije meraq li dora xwe diniherî, bala xwe dida wê qelebalixiya dora xwe, li ke-vokên li meydanê diniherî, bêhna xwe dikişand û qet dengê xwe jî dernedixist. Bi dû re, Mîtanî û Bedirxên dê ji daketina wan ya ji otobusê û heta Robîn bêhiş ketibû erdê, ji Robîn re ta bi derziyê vekira. Wan dê

behsa ecêbmayinên xwe, qelebalixiya biheyecan ya li dora wan civiyabû, rewşa wî ya li erdê, gava xwe bi ser kêlekê ve qulipand û bi zikê xwe girt û
mîna ko janek dikişand naliyabû, sîleyên ko li ruyê wî dixistin û tirsa xwe bikira. Bes Robîn dê tu carî ne ji wan re û ne jî kesekî din re behsa vî kabûsî û yên ko li dû wî dihatin bikira.
Carinan wî dê ji xwe re bigotaya:
— Kabûs jiyaneke din e. Ji yê ko ew kabûs dîtiye û pê ve, tu kes ne dikare têbigihêje û ne jî mahneyekê bidiyê.
Ji lewre, gava Mîtanî pirsa xwe dubare kir, ji wî re gotibû:
— Ez nizanim, hema ji nişka ve serê min gêj bû. Min ber xwe nedît û ez ketim erdê.
Herçî Mîtanî bû, wî dê baweriya xwe bi vê bersivê neaniya û her mer-aq bikira bê çi bi serê birayê wî hatibû ko birayê wî jê re nabêje. Wî dê bi-rayê xwe her di rewşeke acizbûyî, an jî liberketî de bidîta. Ji ber vê yekê, ew ê têbigihişta ko tiştin ji wî têne veşartin û nayên gotin. Di ber re jî ew ê bêtir li ber birayê xwe biketa û ji bo ko dilê wî xweş bike, wî dê betir hewil bidaya xwe.
Ji kuştina birayê wan î mezin Seydo û heta wê rojê, ji xwe di navbêra herdu birayan de nêzîkbûn û hezkirineke mezin peyda bûbû. Vê rewşa nuh, dê ew bêtir bi hevdu girê bidana, hezkirina wan xurttir bikira.
39
REŞ Û SPÎ

Mîtanî dê Robîn her têxista şûna Seydo û hereketên wan bişibandana hevdu. Ji ber vê yekê, wî dê di dilê xwe de, cihekî weha bidaya Robîn ko tu kesî nikarîbû lê bifikiriya.
7. Têkçûyin li navê mirov napirse…

»Bîranîyên min nenivîsîne, hinkes dibêjin qey dîrok e...«, Ahmet Tellî
Li malê şîv dihat xwarin. Resûl Beg rahişt sênîka xwe û derbasî odeka din bû. Hemû kufletê wî li hêwanê li ser sifreyê bûn. Gelek caran weha dikir û li cem zarokên xwe rûnedinişt. Herçî Resûl Beg bû, piştî kuştina lawê xwe, weke ko ji hemû dinyayê xeyidîbe, li cem tu kesî rûnedinişt. Di vêya de, tesîra emeliyata qirika wî jî hebû. Piştî emeliyata qansêrê, bê têlên dengan mabû û ji ber vê jî hew dikarîbû bipeyiviya.
Resûl Beg, ew mirovê ko di dema xwe de zilamekî li ser xwe, girs û qelew bû û gava ko li Diyarbekirê dimeşiya xelk ji ber wî radibûn ser piyan, bi carekê ketibû, lawaz bûbû. Işaretên vê rewşê, dê xwe di roja kuştina lawê wî de xuya bikira û Resûl Begê ko gelek caran tengasî kişandibû, lê tu carî weha belengaz nebûbû, dê pişta xwe bidaya dîwarekî, serê xwe bera ber xwe bidaya û digel neçariya xwe ya li hember kuştina Seydo û kerba xwe, bi dizî bigiriya.
Resûl Beg ji malbateke mezin bû. Kalikê wî, Silhedînê Mîrxo, berî şerê dinyayê yê yekem ko bi dû re dê sînor têxista nava merivên din, tevî çend malên xwe li deşta Diyarbekirê gundek kirîbû û li wira bi cih bûbû. Di serî de, bi kar û barên xwe bala xelkê gişî kişandibû ser xwe. Ji ber ko Silhedînê Mîrxo alimek bû, xelkê wê dorhêlê, xwe li wî girtibû. Silhedînê Mîrxo û zarokên wî, piştî ko bi temamî bi cih bûbûn û dostaniya eşîrên cîran qezenc kiribû, ji bo ko şerên di nav eşîrên der û dorê de ko gelek mêr
ji hev kuştibûn nemîne, heta jê hatibû hewil dabû û bi vî awayî gelek eşîr li hevdu anîbûn. Ew bi xwe bûbû dostê Şêx Seîdê Pîranî jî û di nav wan de, hezkirineke mezin peyda bûbû. Lê çi feyde, dilê Silhedînê Mîrxo li hember kuştina hevalê wî debar nekiribû û sekinîbû.
Bi dû mirina Silhedînê Mîrxo re, malbat hebekî ji hev belav bûbû û nexweşî ketibû nava wan û êşîrên cîran jî. Kurê wî Elîxan Beg,

nexwastibû dijîtiya nav eşîran kûr bibe. Ji ber vê yekê, bi her eşîrekê re, bi
awayekî dostanî danîbû. Kirîvanî yek ji wan pêşîlêgirtinan bû. Bi vî awayî, xwastibû pêşiyê li nexweşiya nav eşîran bigire û dostaniyê nuh
40

bike. Bi dû re, xweha xwe ji xwe re kiribû berdêlî û qîzek ji eşîreke cîran anîbû. Wê gavê, eşîrên din jî hem ji bo xatirê Silhedînê Mîrxo û dostaniya wan a berê, hem jî ji bo hewildanên Elîxan Beg ên aştîxwaz, tevî hemû zilamên xwe hatibûn daweta wan û govend geş kiribû.
Resûl Begê kurê Elîxan Beg, hê di xortaniya xwe de, bi jîrîtiya xwe û bi hurmeta xwe ya li hember însanan, hezkirina herkesî qezenc kiribû. Li gel çend deverên din, li medreseya Cizîrê jî xwendibû, Lê ji ber nexweşiya bavê xwe, dev ji medreseyê berdabû û ji ber ko umrê wî mezin bûbû, li ser daxwaza bavê xwe, bi keça Temîr Axayê dostekî Elixan Beg, bi Leylaya ko dê çar law bidana wî re zewicîbû.
Pez û dewarên wî nedihatin hejmartin. Bi hezaran donim erdên wî hebûn. Meriv pê disekinîn. Li ber barê gelek mirovan radibû. Hema ko mirov ketibe tengasiyekê û carekê berê xwe dabe gundê wî û xwe li wî girtibe, wê gavê nabûn tune bû. Odeya wî hertim tije bû. Li odeyê, qehweya tal tim û tim amade bû. Gava mêvan dihat, şingîniya misînên qehweyê û hime hima zilaman û bêhna qehweya tahl tevî hev dibûn. Vê adeta qehweya tahl jî bi destbirakê wî yê eskeriyê re ji beriya Mêrdînê hat-
ibû gundê wî. Û piştî ko destbirakê wî ji ber dijminatiyê û mehkûmiya ji ber wê, li ba wî sê salan mabû, êdî qehweya tahl bûbû perçeyekî jiyana gundê wî.
Lê rojekê, pêleke mîrata fesadiya eşîran hat û dostanî û aştî dan ber xwe

û Resûl Beg ji ber kuştina du pismamên xwe, li hemberî eşîreke din mecbûrî birêvebirina şerekî eşîrî bû. Dijminatiyê jiyana wan bi temamî guhertibû. Êdî, nifşên nuh di nav dijminahiyê de mezin dibûn. Bi hisên heyfhilanînê, bi kîn û nefreta li hember eşîra dijmin xwedî dibûn. Wan û dijminê xwe ji salên şêstî û heta dema lihevhatinê, bi dehan mêr ji hevdu kuştibûn. Bi dehan jin bî mabûn û bi sedan zarok jî sêwî…
Lê belê her ko dem di ser re diçe, civat tê guhertin û ev guhertin rengê minaqeşeyên nava malbatan diguherîne. Zarokên xwende, xortên şiyar vê yekê bê mahne dibînin û tu carî nafikirin ko êdî rahêlin silehan û be-ra xortên eşîra din bidin. Berê pesnê dijminatiya eşîran pir dihat dayin, lê di bin tesîra wê atmosferê de, mirovên eşîran bi xwe, xortên wan, keçên wan ji navê dijminatiya eşîran fedî dikir û dixwast rojekê beriya rojekê vî navî ji ser xwe biavêjin û pêvajoya telefbûna malbatan a bi vî awayî rawestînin. Rîhsipiyên herdu eşîrên ko heta niha bi dijminatiyê hevdu mahf kiribû, piştî wan guhertinan û tecrubeyên salan jî bi ser de, xatirê xortan û camêrên herêmê neşikenandibû û nexweşiyeke mezin derman

kiribû. Piştî wê jî odeya wî ji berdêla fesadiya ko dijminahî kûr dikir, bûbû cihê minaqeşeyên pirsên cida. Herroj mirovên cida, xortên nûhatî dihatin ba wî, minaqeşeya fikrî bi wan re dikir. Carinan, du grûpên cida li ba wî li hevdu rast dihatin. Wê gavê, gundî hemû li dora wan diciviyan û li minaqeşeya herdu grûpan guhdarî dikir. Odeya wî, bûbû dibistaneke nû. Şevbihêrkên wê bûbûn dersên balkêş û bifêde. Lê, Resûl Beg her wê demê ji xortan re digot; »Lawo, piştî kurmanciya reş û zazakiya xweş hebin, hûn ji bo çi devê xwe xwar dikin û bi zimanekî din minaqeşeyê dikin. Gundî ji we tiştekî fahm nakin.« Ji ber ko li odeya wî, heta wê gavê,

ji derveyî memûrên dewletê û cendermeyên qereqolê, suhbet her bi kurdî bû. Kurdî zimanê odeyê bû. Lê, qeweta wî nedîgihişt ko vêya biguherîne, ji ber vê yekê, pêlê ew jî gundiyên wî jî dan ber xwe. Tevî vê jî dilê wî qet ne rehet bû.
Dewran hat guhertin. Pêleke xezebê hat bi ser wan de. Pêleke din û pêleke din… Û wan xwe nema li ber girt. Ji xwe, ji dema dijminatiyê û vir de, maleke wan li Diyarbekirê bû. Ji ber vê yekê, Resûl Beg nîvgundî û nîvdiyarbekirî dihat hesibandin. Piştî ko beriya ko Seydo bê kuştin bi şeş salan, leşker cara dawiyê hatin û li dewsa bênderan, hemû zilam li pêş
çavên pîrekan şilf î tazî kirin û pêtiyê agirê ko bi xaniyan ket, di ezmanan re derket û dûmaneke şewatê ya reş ezmanê gundê wan bi temamî nixumand, êdî ji mecbûrî, biryara xwe da.
Heta wê gavê, bi zorê îdare kiribû. Lê gava gundê wan bi temamî hat hilweşandin, cih û war li ber wan hat xerakirin û bi vî awayî kêr gihîşt hestî, wan jî wek gelek kesan, erdên xwe yên ji ber zilmê, bi salan nehatibûn çandin, li dû xwe hiştin û mala xwe ya mayî jî bi temamî bar kir û anî danî ser mala din.
Li Diyarbekirê jî li ber barên gelekan radibû. Mala wî dîsa cihê suhbetê, cihê sitarê, cihê baweriyê bû. Seydo hêdî hêdî bûbû sermiyan û kêfa Resûl Beg bi qasî dinyayekê jê re dihat. Dora wî hertim qelebalix bû. Seydo ne ji bo malbatê, lê herweha ji bo dora xwe jî bûbû hêviyek. Û piştî barkirina wan bi şeş salan, xezeba bûbû du gule û xwîna sor herikandibû.
Bi dû kuştina lawê wî yê mezin Seydo re, piştî çend tehlîlan doktoran biryara emeliyatê dabû. Wî çi qasî li ber xwe bidaya jî dê bi zora zarokên xwe, li Enqereyê du emeliyatên ko dê ew pênc mehan ji welêt bi dûr bixista û heta dawiya umrê wî tesîr li wî bikiraya, bihatana kirin. Û bi vî

awayî, Resûl Beg dê bibûya nîvzilam.
42

Ew zilamê li ser xwe ko peyva wî li ba xelkê pere dikir û di dema xwe de, bi camêrtiya xwe ve dostaniya herkesî kezenc kiribû û xatirê wî li ba xelkê pir bû, niha fedî dikir ko bi zarokên xwe re şîvê bixwe. Ew ê carinan bi zora kufletên xwe bihata ser sifreyê, lê dîsa jî ji ber ko ji wan fedî dikir, wî ê dev ji vê adeta xwe bernedaya.
Kêfa wî bi tenê ji tiştekî re dihat. Gava zarokên xwe yên mayî bi hevdu re didîtin, ev kêf di dilê xwe de his dikir. Wê gavê, kêfa wî ewqasî dihat, tu nedima ko ji kêfan bask pê şîn bihatana û bifiriya. Niha, her çi qasî zarokên wî dikarîbû bi serê xwe bijiyana jî wî hê xwe li hember wan berpirsiyar his dikir û digot qey heke ew nebe, ew ê zarokên wî ji hevdu bela wela bibin û nema bikaribin bi ser hev de werin.
Wî çi bixwastaya, tavilê dihat ber wî. Zarokên wî nedihişt, ew destê xwe di ava sar û germ de dake. Carinan, Robîn ji bo ko li malê aciz nebe, ew bi xwe re derdixist derve û digerand jî. Carinan jî ew û bermaliya xwe Leyla Xanimê bi hev re derdiketin û li bajarê ko wan ê tu carî jê hez neki-ra digeriyan. Ji ber ko bi zimanên wan nizanîbû û xwe dûrî wan didît, zêde nediçû qehwexaneyên ixtiyaran yên nêzîkî mala xwe jî.
Ji ber şerwal û êlegê wî, carinan hin zilamên ko wî ew nas nedikirin jî silav didanê. Gava derdiket derve, yên ew bidîtaya, ew nas nekira jî ji meşa wî û niherînên wî dizanîbû, bê wî çi qasî derd kişandiye.
Li malê, ji bo wî odekek hatibû veqetandin. Teyba ko wî bi xwe ji welêt anîbû, li odeyê hatibû danîn. Di wan rojên wî de, teyba wî û kasetên wî yên şixulê dengbêjan, ji wî re bûbûn heval.
Zimanê wî çepikên wî bûn. Bi çepikan bangî yên dora xwe dikir û bi piste pistan derdê xwe bi zorê bûya jî bi wan dida fahmkirin. Ew zilamê

ko bi peyveke wî eşîrek radibû ser pêyan, bûbû mîna zarokan êdî. Ji tiştê herî piçûk jî dikarîbû kêfek werbigirta û li çepikan bixista.
Piştî şîvê, Robîn rabû çû odeka wî ko ji wî re bibêje »were çayê vexwe.«
Deriyê odeka wî, weke hercar girtî bû. Guhê xwe da derî û guhdarî kir.
Ji hindur dengê kilamekê dihat. Têgihişt ko bavê wî dîsa li ber teybê rûniştiye. Belkî sed kasetên wî yên weha hebûn. Çi yên ji welêt anîbûn, çi yên ko bi dû re jê re hatibûn şandin, çi yên ko heval mevalên Mîtanî ji wî re dianîn…
Robîn derî vekir û ket hindur. Resûl Beg bi wî nehisiyabû. Li ber kil-amê ji ser hişê xwe çûbû û xwe li gora dengê dengbêj kil dikir.
... erê lo lo, erê lo lo
43
REŞ Û SPÎ

lo çeleng û xortê eşîra Mîr Izedîno, lo lo
lo siwarê gundê mino
ma çawa bû ko tu bi tena serê xwe û destvala
di nava eşîra dijminê xwe de mayî, lo lo
de lehengê dilê mino lo
berdilkê keçikên gundê mino, aaax ay...
Dengê dengbêj li odeka nîvtarî belav dibû. Robîn li dora bavê xwe zivirî û hat li pêşiya wî sekinî. Beyî ko tiştekî bibêje, li wî niherî. Serê Resûl Beg di ber wî de bû. Robîn li ber wî daqûl bû. Digel ko dizanîbû, bê ew ê çi bibîne jî serê xwe xwar kir û li ruyê wî niherî û got:
— Tu çi dikî, bavo?
Deng ji Resûl Beg derneket. Gava Robîn çavên wî yên sorbûyî ko li jêrê diniherîn dîtin, têgihişt. Resûl Beg digiriya. Robîn bavê xwe careke din di vê rewşê de dîtibû. Roja kuştina Seydo jî li ber derî weha rûniştibû û bi

dizî giriyabû. Vê carê jî eynî mîna wê carê, weke zarokekî ko hinek li ber çavên wî tahdeyê li bavê wî bikin û ew nikaribe bavê xwe xelas bike, qe-herî û bêhna wî teng bû. Dilê wî ji ber hêrsa wî rabû û daket. Çavên wî ji nişka ve sor bûn. Kesereke kûr kişand. Bîstikekê li hemberî hev bê deng rûniştin.
Resûl Beg ji bo ko Robîn bi giriyê wî nehise, serê xwe ranekir. Robîn jî weke ko hayê wî ji giriyê Resûl Beg tune be, hereket kir. Resûl Beg jî dizanîbû ko Robîn bi wî hisiyaye, lê belê ne wî û ne jî Robîn ji kesî re behsa vî giriyî kir. Bi dû re Robîn destê xwe dirêj kir û teyb girt. Dengê kilamê biliya. Rabû ser xwe û got:
— Heke tu dixwazî çayê vexwî…
Hew deng ji wî hat. Kela girî xwe li qirika wî jî girtibû. Dengê wî diler-izî. Rewşa wî, bala Resûl Beg jî kişandibû. Ji bo ko lawê wî nekeve ber fediyê, hewil da xwe û beyî ko serê xwe rake, aliyê derî nîşan da û destê xwe mîna ko bixwaze tiştinan bibêje kil kir.
Resûl Beg piştî ko hebekî hat ser xwe, hêdî hêdî rabû, çû destmêj girt. Bi dû re hat û li odeka xwe, di tariyê de limêj kir. Ancax piştî limêjê, hat hêwanê. Ew û Robîn weke ko bîstika din, hevdu di wê rewşê de nedîtibe, weke ko tiştek nebûbe, tev geriyan. Ji bo ko hevdu nexin ber fediyê, li hev jî neniherî.
Qedeha çayê di destê Robîn de, beyî ko bizanibe bê li kîjan kanalê temaşe dike, li televîzyonê diniherî. Resûl Beg çû li ser yanê rûnişt û li
44

benda çayê ma.
Xuya bû ko dîsa aciz bûbû. Kulên dilê wî careke din tev rabûbûn. Her gava ko bi tenê bimaya, hema diket odeka xwe û derî li ser xwe digirt û li ber teyba xwe rûdinişt. Ne ev kasetên kilamên dengbêjan jî bûna, Resûl

Beg belkî dê ji qehran biheliya û bimira. Ew kilam û stranên ko wî lê guhdarî dikir, welatê wî yê jihevbelavbûyî, warê wî yê ko niha nikare tevî zarokên xwe vegerê û tê de bistire; miriyên wî, bîraninên wî yên zaroktî û
xortaniyê ko li deşta Diyarbekirê û kolanên bajêr ên dîrokî derbas bûbûn, dianîn bîra wî. Her ko weha dibû jî ji ber neçariya xwe digiriya û bi dizî serê xwe li dîwaran dixist. Ew hêrsa ji cerga ko bi xwe dizane di dilê wî de dikeliya, niha ji hercar xerabtir bûbû.
Mehabadê çayek sivik dagirt û anî danî ber wî. Resûl Beg gulpek ji çaya xwe vexwar û weke ko hê jî li wê kilama bîstika din guhdarî dikir, di hindurê xwe de, pê re digot:
... erê lo lo, erê lo lo
jîrikê gundê mino, lo lo
şêrê eşîra mino, lo lo
go bi tenê ev hal tê serê mêra, lo lo lawo
ji dawiyê de li te xist û termê te veşart, lo lo
û erê lo lo, ez hê divêm tu ê rojekê werî lo lo
û ax mîrê mino lo lo û ax li mino aaax ay...
8. Kabûs û xewn tev li hev dibin...
Piştî çendekî, nivînên wan hatin danîn. Herkes çû ket nava nivînên xwe û ji derveyî odeka Mîtanî, hemû lempeyên malê tefiyan. Mîtanî li ser piyan sekinîbû û bi jina xwe re dixeyidî. Resûl Beg li odeka kêleka wan, ji kerban, mîna karkerekî ko ji sibehê heta êvarî xebitîbe û westiyabe di xew re çûbû. Leyla Xanimê li cem mêrê xwe Resûl Begê pal dabû û li dengê wan guhdarî dikir.
Bûka wan, keça pismamê Resûl Beg bû. Du meh berê hatibû. Dilê Leyla Xanimê bi ser xwarziya wê Gulperiyê de bû. Hertim digot ko Gulperî wek gulekê ye û jina malan e. Lê piştî dîtibû ko Resûl Beg behsa

keça pismamê xwe dike, hew wêrîbû ji wî re behsa ya dilê xwe bike. Leyla Xanim ji serî de, ji merivên Resûl Beg hez nedikir. Ev kîn ji berê de, di dilê wê de hebû. Çil sal berê, gava ko bi Resûl Beg re zewicîbû,

45

REŞ Û SPÎ

merivên Resûl Beg ji bo ko ji nav merivên xwe jinek neanîbû, dilê xwe ji wî girtibû û ji bo ko bûbû sedema jihevbidûrketina wan û Resûl Beg jî bi çavên dijminatiyê li Leyla Xanimê niherîbû. Ji lewre, gava ko ji wê hatibû pirsîn, bê ka li ser Binevşê, keça pismamê Resûl Beg, çi dibêje, wê beyî dilê xwe gotibû »baş e, ne xerab e.«

Ji wê rojê de, bala herkesî kişandibû. Xwasteka wê di dilê wê de mabû. Lê, wê tu carî ya dilê xwe ji kesî re negotibû. Hê jî gava ko dengê Mîtanî û Binevşê dihat wê, ji xwe re digot:

— Heke bi ya min bikiraya, ew ê baştir bûbûya.

Leyla Xanim piştî ko weke hercar dengê sîleyên Mîtanî û nalînên Binevşê bihîstin, çavên xwe bi rehetî birin ser hev û raket. Sibehê zû, gava bi xwe bihisiya, dê bidîta ko bûka wê berî wê rabûye û firaxan dixe mekîneyê. Binevşê dê ji aliyekî jî taştê amade bikira. Bes, Leyla Xanim weke navê xwe dizanîbû ko ew ê du rojên din dîsa bihata guhertin û bibûya weke berê. Ji lewre, gava piştî şevên weha, ew di medbexê de didît,

di ber xwe de dikeniya.

Dengê şerê Mîtanî û Binevşê çûbû Robîn jî. Hew carinan, gava Mehabadê gazindên xwe yên di vî warî de bi wî dikirin û ji ber wan gazindan aciz dibû, bi Mîtanî re dipeyivî. Ji derveyî wê, elaqa xwe bi wan nedianî. Wê şevê jî gava ko dengê şerê wan bihîst, bêhna wî teng bû. Ji xwe, xew neketibû çavên wî. Nivînên xwe li balqonê danîbû. Enîşkên xwe ji

serê xwe re kiribûn destek û veketibû, li ezmên diniherî.
Şev bi qasî ko mirov dikarîbû bifikiriya tarî bû. Hêyv li jorê, mîna sênîkeke zîvî xuya dikir. Li nêzîkî hêyvê, du stêrkên piçûk yên li cem hev diçirisîn. Ji wan gelekî bi dûr, li aliyê rojava, stêrkek ko ji wan ên din hebekî mezintir, xuya dibû. Dengê çirçirkan dihat. Bayekî hênik jî pê re xwe li wî digirt.
Herçî Robîn bû, giriyê bavê wî hê ji bîra wî neçûbû. Ji ber wê, heta ko çavên wî ji xweber çûn ser hev jî li bavê xwe û aciziya wî difikirî.
Gava ko li xwe hay bû, li kolaneke dirêj û tarî bû. Wî tu carî ev kolan nedîtibû. Her dever tarî bû û li der û dorê tu deng jî tune bû. Ji nişka ve dengek hatê û tirsek ket dilê wî. Zilamek ji kuçeya pêşiya wî derket û di nav wê tariyê de, ber bi jorê ve baz da. Du zilamên din jî li wira xuya bûn û da pey wî zilamî.
Çav li Robîn neketibûn. Robîn çi qasî xwast ko vegere û xwe ji wira bi dûr bixîne jî bi awayekî bêhişî bi aliyê wan de diçû. Zilamên ko bera pey yê din dida, gelekî girs bûn û pir bi lez baz dida. Piştî bîstikekê, di neqe-
46

bekê re bihurîn û wenda bûn. Gava ko Robîn gihîşt serê neqebê, dît ko ew zilamê di pêşiyê de direviya li erdê ketiye û herdu zilamên din, bi sile-hên destên xwe lê direşînin. Canê wî dikin serad. Zilamê li erdê, bi her guleyekê, carê ji erdê hilor dibû û dîsa diket. Dengên silehan û qêrînên zilêm, tev li hev dibûn û li der û dorê belav dibûn. Herdu zilamên ko cer-cûrên xwe di mêrik de vala kirin, hingî dilê wan rehet nedibû, bi awayekî hêrsbûyî bi pehînan jî li wî dixist.
Robîn jî nizanîbû bê çima, lê di dilê xwe de his kir ko ew zilam dijminê wî bi xwe ne jî û ger ew têkeve destê wan, ew ê wî jî bidin ber guleyan û bêrîkan di canê wî de vekin. Ji bo ko zilam çav li wî nekevin, xwe bi lez

da ser hev û avêt paş neqebê û pişta xwe da dîwêr
Di nav xwêdanê de mabû. Newêrîbû serê xwe ji neqebê derxistaya. Dora wî tarî bû. Mîna ko her dever bi rengê reş hatibe boyaxkirin, tu tişt xuya nedibû. Robîn digot qey ew ê aniha hinek ji nav tariyê derkevin û xwe biavêjin ser wî û wî bifetisînin. Dilê wî dikir gupe gup. Ji gupîna dilê wî, sînga wî jî bi lez radibû û dadiket. Weke ko di bin barana zivistanê de mabe û bi tayê ketibe, diricifî. Çavên wî dikira ji serê wî baz bidaya. Ruyê wî zipîzer bûbû. Tu nemabû ko biketaya û bimiraya .
Wî ê jî bi dû re ji xwe re bigotaya :
— Ez tu carî ewqasî netirsiyabûm.
Piştî ko dengê silehan hat birîn, Robîn ji bo ko der û dorê qontrol bike, xwe hişk bi dîwêr girt û bi tirs serê xwe ji paş neqebê dirêj kir. Ji meytê zilêm pê vê, tu tişt ne xuya bû. Bi dû re dît ko pîrekek ji kuçeyekê bi baz-dan hat û xwe avêt ser termê zilêm. Çongên xwe dan erdê û bi hutikan li sînga xwe xist û qêriya. Robîn ew jinik jî nas nedikir, lê dizanîbû ko jina wî zilamê kuştî ye.
Wê gavê, meytê Seydo hat bîra wî û weke ko ji nişka ve kêrek li ser dilê wî bikeve, dilê wî êşiya û dev li lêva xwe kir. Mirov digot qey kuştina Seydo jî eynî weha bûbû. Wî kuştina Seydo nedîtibû, lê aniha didît. Digel ko Seydo azib bû jî Robîn tê derxist ko ew meyt yê Seydo ye. Bi dû re, ew ê jî li vê zanebûna xwe ecêbmayî bimaya û ji xwe re bigotayaya:
— Min jî nizanîbû, bê ev ji kû hate bîra min.
Robîn pişta xwe dîsa da dîwêr û weke ko bêhna wî hebekî hatibe ber wî, xweziya xwe daqurtand û çavên xwe girtin û vekirin. Hew mabû ko gava xwe biavêje û derkeve û bireve, lûleyeke cemîdî di cênîkê xwe de his kir. Di cihê xwe de mat ma. Tu nemabû ko dilê wî bisekiniya. Zilamekî ruyê wî nexuyayî li ber wî sekinîbû û devançeya xwe bi cênîkê wî ve

zeliqandibû. Zilam ne diliviya, ne jî tiştek digot. Robîn dizanîbû ko ji şû-na xwe bilive, zilam dê guleyan di pey hev re bera serê wî bide. Seqemekê xwe li canê wî girt. Weke ko li benda guleyê bisekine, çavên xwe hişk girtin û situyê xwe kişand hindur. Nikarîbû, ne bang bikiraya, ne jî bireviya. Digel ko Robîn ew nedidît jî dîsa bi wî awayê ecêbmayî, dizanîbû ko zilêm tiliya xwe daniye ser lingê wê û dike bikişîne.
Zilêm ling kişand û sekinî. Şerqîniya hesin hatê. Wê şerqîniya ko ji lingê debançeyê derket, di nav bêdengiya tariya der û dorê de olan da û belav bû. Xwîna ko di damarên Robîn de diherikî, bi carekê mîna ko qeşa girtibe, sekinî. Bi dû re, wî ê jî ji xwe re bigotayaya:
— Nayê bîra min ko ez tu carên din ewqasî nêzîkî mirinê bûbûm.
Dengê melayekî hat wî. Mirov digot qey ji her aliyî eynî deng tê. Azaneke dûdirêj ko gotinên wê tu carî nebihîstibû… Robîn têgihişt ko ew azan li ser wî tête xwendin. Melê azan neqedand. Robîn carekê hewil da xwe û gavek avêt.
Gava xwe di valahiyê de avêtibû. Mîna ko mirov bibêje qey hindik maye ko mirov di newalekê de wer bibe, di cih de, xwe hişk bi nivînên xwe ve girt. Bi dû re, gava ko lê hay bû, dît ko lingê xwe beyî îradeya xwe li betaniya xwe xistiye. Bêhna xwe bi rehetî berda û dîsa xwe dirêj kir. Destê xwe da eniya xwe. Eniya wî xwê dabû.
Dinya rohnî bûbû. Roj derketibû. Ji derve, dengê erebeyan dihat. Ji xaniyê ser wan jinikeke ko dengê wê bi Robîn qet nexweş bû, lê tevî vê jî hema her sibeh jî dengê wê dibihîst, derketibû balqonê û bi wî dengê xwe yê ko mirov digot qey hinan pê li teriya wê kiriye, bangî lawê xwe yê li hewşê dikir. Ji xwe dengê wê ne bes bû, îcar dengê giriyê lawê wê jî bi ser

de. Gava herdu deng digihîştin hevdu, îmana Robîn dihat serê bêvila wî. Robîn bi dengê jinikê mahdê xwe tirş kir û xeber ji wê re da. Xwe bi ser kêlekê de xwar kir û ji bo ko wê bi qîrqîra xwe herkes aciz dikir, lahnet li wê anî. Kabûsê xwe ji bîr kiribû. Di ber xwe de kire ufe uf.
Her deverê laşê wî diêşiya. Ev êşa ko carinan gava mirov ji xew radibe, xwe li laşê mirov digire û dike ko mirov hema ji xwe re vekeve û tiraliyê bike, piştî her kabûsekî weha, xwe li laşê wî jî digirt.
9. Leyla Xanim, Binevş, Mîtanî, Serdar,
Meryem, Mehabad...
Dengên kevçî û qedehan ji hindur dihatin. Xuya bû dîsa yekê beyî dilê
48

xwe taştê amade dikir. Ji dengên ko derdixistin, eşkere dibû ko ew kes pir hêrs bûye. Çawa mirov ji qazî, kevçî û sênîkan li hev bixe, wê jî eyn weha dikir. Bi dû re, dengê avê hat. Deriyê daşirê vebû. Leyla Xanima ko milên xwe heta enîşkan hil kiribûn û hê jî av ji dest û ruyê wê diniqutî, ji daşirê deriket. Gava ber bi hêwanê ve meşiya, carekê berê xwe da medbexê, di ber xwe de keniya û serê xwe kil kir.
Rahişt sucdeyê û li ber xwe, li erdê raxist. Leçeka serê xwe rast kir. Herdu tiliyên xwe yên girdekê birin binê nermikên guhên xwe û di ber xwe de tiştin gotin. Bi dû re, destên xwe li ser sînga xwe danîn ser hev û tiştin din gotin. Destên xwe birin ser çongên xwe, xwe daqûl kir û dîsa rabû. Eynî hereket dubare kir, lê vê carê çû sucdê û rûnişt. Di ber xwe de jî her dia dixwendin. Piştî ko rik'eta duyem jî qedand û li ser herdu milên xwe bi dorê zivirî û silav da, serê sucdeya xwe lê qulipand û destên xwe vekirin. Vê carê, di ber xwe de gelek tişt gotin û dengê xwe jî piçekî rakir. Bi dû re, destên xwe birin ruyê xwe, ruyê xwe mist da û rabû ser xwe. Leyla Xanim rahişt tizbiya xwe û hat hêwanê, di kêleka nivînên zarokan

re derbas bû û çû li ser yanê rûnişt. Libên tizbiyê yek bi yek dikişand û di ber re jî tişt mişt digotin.
Leyla Xanim piştî ko dîsa destên xwe vekirin, hin dia xwendin û ruyê xwe dîsa mist da, rabû çû medbexê û li sifreya ko Binevşê datanî niherî. Binevşê ji bo ko têkeve çavê wê, weke ko li wê hay nebûbe, mîna pîrekên giran ko gava karekî dikin li tu tiştekî din nafikirin, bala xwe bêtir da karê xwe. Û vê carê, tu deng ji kevçî û sênîkên wê jî derneket.
Binevşê piştî ko zarokên din jî rabûn û nivînên xwe hilanîn, sifreyeke mezin anî û li orta hêwanê raxist. Tişt miştên din jî hêdî hêdî anîn û li ser sifreyê bi cih kirin. Bi dû re, çû Mîtanî jî şiyar kir û heta ko wî serçavê xwe şuşt, destmaleke spî û paqij di dest de li benda wî sekinî.
Robîn her ko ew di vê rewşê de didît, bi awayekî ecêbmayî li wê temaşe dikir. Bes tu carî tesîra lêxistina Mîtanî, zêdeyî sê-çar rojan dewam nedikir. Ew jî hew gava ko Mîtanî li malê bû, yan jî xwesa wê bala xwe di-dayê, welê bû. Piştî ko Mîtanî diçû kar jî dîsa diket odeka xwe û mîna ko xeyidî be, heta êvarî kesî ruyê wê nedidît. Nedihat firavîn jî bi yê malê re nedixwar. Gava ko birçî dibû, weke ko bi dizî tiştekî bike, diket medbexê û bi tena serê xwe xwarin dixwar. Ji her du-sê rojan carekê jî telefonî mala bavê xwe dikir û ji bo ko li gund herkes behsa wê û rehetiya wê bike û xweziya xwe bi dilê wê bîne, digot »yeka min nabe dudu, ez wek siltana me.«

49

REŞ Û SPÎ

Piştî demekê, wê jî bawerî bi van derewên xwe dianî û ji xwe re digot qey bi rastî jî bûye siltan û gava ko diketin odeka xwe, dek li mêrê xwe dikir û jê re digot:
— Ez li hindur pir aciz dibim. Welehîn, hema ez dibêjim qey ez dikim

bifetisim. Ma ka tu ê min çiçax bibî bigerînî?
Wê gavê, Mîtanî têdigihişt bê derdê wê çi ye û ji ber vê yekê, ji wê re digot:
— Zarok jî li malê aciz dibin. Rojekê, em ê giş bi hevdu re derkevin û biçin seyranê. Wê gavê tu ê jî ji xwe re bigerî û ew ê bêhna te fireh bibe.
Gava Mîtanî weha digot jî ji ber ko bersiv ne li gora dilê wê bû, poşman dibû ko tiştekî weha gotibû. Ji ber ko wê dixwast, mîna ko ji xwe re xeyal dikir, têkeve milê mêrê xwe û mîna yên di filîman de, heta nîvê şevê bi tena serê xwe bigerin. Lê, ew ê ev xwasteka wê her di dilê wê de bimaya û
jê re bibûya kul. Ji ber ko Mîtanî dê tu carî ew bi xwe re nebira gerê û bi ya wê nekira.
Heta ko Mîtanî nehat, ew jî li ser sifreyê rûnenişt. Meryem û Serdar jî li vê guhertina ko gelek caran dîtibû, ecêbmayî mabûn û beyî ko hayê Binevşê jê çêbibe, bi dizîka li hevdu û li Robîn diniherî û di ber xwe de dikeniyan.
Serdar xortekî şanzdehsalî û çeleng bû. Porê xwe mîna yê Robîn bi paş de şeh dikir û mîna wî dimeşiya. Ji bo ko têkeve çavê Robîn, çi hevalên wî yên keçik hebûna, dihat û ji Robîn re behsa hemûyan dikir. Gava ko Robîn ne li malê bûya, diket pirtûkxaneya wî, navên pirtûkên nû ji ber dikirin, di rojnameyan de tişt miştên ko li ser wan hatibûn nivîsandin dixwendin û êvarî gava ko dihat malê, ji wî re digot. Ji Robîn hînî xwendin û nivîsandina kurdî jî bûbû û ji bo ko bi wî re li ser wan têkeve minaqeşeyê, carinan pirtûk jî dixwendin. Rojekê weke zilamê rastî, hatibû û ji Robîn re gotibû:
— Van rojan, pir behsa romana Homerosî dikin. Tu dibêjî hêja ye ko mirov bixwîne, lo?
Robîn li hember vê gotinê, xwe negirtibû û têra xwe keniyabû. Bi dû re

jî ji bo ko wî nexe ber fediyê, kenê xwe bi zorê sekinandibû û jê re gotibû:
— Eferim ji te re.
Di pê wê re jî gotibû:
— Eferim eferim. Bixwîne, helbet divê tu bixwînî. Homeros çawa ne hêjayî xwendinê ye, malava! Çend kesên ko mirov divê bixwîne hebin, yek ji wan jî ya Homeros e.
50

Serdar ji bo ko Robîn gotibû, roja din çûbû û rahiştibû berhemeke Homerosî . Lê di ber re jî li ser wî kenê wî, ji xwe re gotibû:
— Ev Robîn jî hema henekên xwe bi mirov dike.
Herçî Robîn bû, kêfa wî pir ji van tevgerên Serdar re dihat. Ji lewre, carinan mîna ko bi hevalekî xwe re bipeyive, bi wî re dipeyivî. Serdar jî ji bo ko Robîn qîmet dida wî û ew dixist şûna hevalekî xwe, pir ji wî hez dikir û ji bo ko Meryem mîna ko ew ji Robîn hez dike ji wî hez bike, xwendin û nivîsandina kurdî hînî wê jî dikir. Gava Robîn bihîstibû ko Serdar xwendin û nivîsandinê fêrî Meryemê dike, ecêbmayî mabû. Ji bo vê, bi kêf pesinê wî dabû û dîsa ji wî re gotibû:
— Eferim Serdar. Min nizanîbû ko tu ewqasî jîr î ha! Helal be ji te re.
Herçî Meryemê bû, ji xwendinê hez nedikir, lê ji bo ko ji Serdar ditir-siya jî newêrîbû bigota »na« û bi ya wî dikir. Keçikeke esmer û bejinzirav bû. Sê salan ji Serdar piçûktir bû. Çavin wê yên mîna çavên diya wê, gir û reş hebûn. Herdu guliyên wê yên ko diya wê jê re dihûnandin, xwe ji ser herdu aliyên milê wê bera ser pişta wê dida. Ji ber hatina wan a Stenbolê, dereng dest bi dibistanê kiribû. Gava hê nû hatibûn, ji bo ko hevalên wê yên dibistanê henekên xwe bi wê kiribûn û ji wê re gotibûn »tu ji çiyê hatiyî » jî wê salê neçûbû dibistanê. Lê gava dest bi dibistanê kiribû, bi jîrîtiya xwe tavilê bala mamosteyên xwe kişandibû û

mamosteyên wê ew ji sinifa yekem derbasî sinifa duyem kiribû.
Gava Mîtanî ket hindur, herduyan jî ji tirsa, kenên xwe birîn û hatin ser sifreyê. Kêfa Mîtanî weke ko do bi şev bi Binevşê re şer nekiribe, li cih bû. Belkî jî wî dixwast weha xuya bibe. Carê li saeta ko li dîwêr daliqiyabû diniherî û bi lez taştê dixwar. Piştî taştê, ji bo ko biçin kar, wî û Mehabadê xwe amade kir.
Mehabad piçûka Mîtanî bû. Ji Mîtanî bêtir bi ser malê de bû.
Pêdiviyên malbatê, nemaze jî yên Leyla Xanim û Meryemê li ser wê bûn. Keçikeke xweşik û xwende bû. Ji bo ko balê bikişîne, hewce nedibû ko xwe zêde bixemilîne jî. Weke hercar, hema porê xwe ji paşiyê girê da, ki-rasê xwe rast kir û da tengala Mîtanî.
Berî ko derkevin, Mîtanî weke her sibehê, pere da diya xwe û bi dizî ji wê re got:
— Tu ê bide Robîn jî. Belkî pereyên wî nemabin.
51
REŞ Û SPÎ

10. Mirov dixwaze hezkiriyeke wî hebe...
»yek ji wan hezkiriyên te ez bûma
û min bikarîbûya di çavên te yên kilkirî de
hêsirên xwe bidîtana...«
Robîn bilêtek avêt qutîkê û ber bi paldankên dawiyê ve meşiya. Lê niherî ko ji derveyî ortê cih nîne, çû li paldankeke ortê rûnişt.
Otobus hema hema tije bû, ji derveyî du sê paldankan, cihê vala tune bû. Robîn lênûska xwe vekir û bala xwe da nivîsekê. Pênûsa xwe ji bêrîka xwe derxist, tiştek çixêz kir. Bîstikekê, beyî ko tiştekî bike, sekinî û li nivîsê niherî.
Otobus li rawestgehê sekinî. Deriyê pêşiyê vebû. Keçikeke ciwan siwar

bû. Bilêt avêt qutîkê û zivirî, çavên xwe li cihekî gerandin. Şifêrê otobusê li wê diniherî. Şifêr, zilamekî bêvila wî xwar û pelixî bû. Serê wî rût û çavên wî beloqî bûn û yek jî ji wan piçekî şaş bû. Levên wî jî qalind û daliqiyayî bûn. Ji paş wê bala xwe dayê û kesereke kûr kişand. Bi dû re, bi hişkînî pê li bişkokê kir û derî girt.
Herçî keçik bû, pantolonekî kont î ko çîpên wê xweş zeft kiribûn, li xwe kiribû. Li ser pantolon, tîşortekî reş lê bû ko zikê wê heta ser navikê li derve dihişt. Porê wê heta ser milan dirêj bû. Ruyê wê esmer î zirav î xweşik bû. Bêvila wê piçekî ber bi jorê de rakirî bû. Ne mimkun bû ko bala mirov nekişanda.
Lawikekî ko simbêlên wî yên zirav ji herdu aliyên lêvên wî berjêr dadiketin, gava ko çav li keçikê ket, xwe da ser hev û ziq li keçikê niherî. Keçik di ber wî re derbas bû û hat li paldanka cem Robîn rûnişt.
Robîn hişk bi lênûska li ser çonga xwe girtibû û berê xwe bi camê ve kiribû. Gava ko keçik li cem wî rûnişt, meraq kir û li wê niherî. Ji nişka ve, weke ko bêhna wî biçike, çavên wî fireh bûn û heyecanekê dilê wî da ber xwe. Gupîna dilê wî, ji guhên wî derdiket. Tevzînokên germ xwe li canê wî girt. Ji eniyê û paş situyê xwe his kir ko xwê dide.
Heta ko daket jî Robîn fedî kir ko li aliyê wê binere. Wî digot qey xelk giş li wî dinerin û ji bo ko henekên xwe bi wî bikin li benda hereketeke wî ne; heke bizivire û li vê keçika xweşik ko kêleka wî rûniştiye binere, dê tiştekî xerab were serê wî û ew ê pir li ber bikeve. Bêhna keçikê dihat wî û serê wî gej dikir. Robîn bêhna xwe bi zorê distend û dikira ji ser hişê xwe biçûya.
52

Heta ko otobus gihîşt cihê ko ew ê dakeve, di nav pêlên heyecanê de gevizî û heliya. Gava Robîn ji bo daketinê rabû ser xwe û ji bo ko keçik rê

jê re veke, bi wê re bişirî, hewla wî têrê nekirê ko fediya xwe û sorbûna ruyê xwe veşêre. Ji xwe, hingî bêhna wî çikiyabû, nikarîbû devê xwe vekira û peyvek jî bikira.
Gava ji keçikê bi dûr ket û hat, pê li bişkoka derî kir, hê sorbûna ruyê wî neçûbû. Ancax piştî ko daket û otobus ji wî bi dûr ket, hê nû bêhna xwe berda û hebekî hat ser xwe.
Piştî daketina wî ya ji otobusê, keçika ko bîstika din li kêleka wî rûniştibû, ji bo ko cihê xwe xweş bike xwe bi aliyê camê de bir û li şûna Robîn rûnişt. Wê gavê his kir ko lingê wê li kaxizekê ket.
Keçikê xwe daqûl kir û rahişt kaxiza spî ya li erdê, li ber lingê xwe. Kaxiz anî ber çavên xwe û vekir. Zêde guh nedayê. Heta wê gavê jî tiştekî anormal pêk nehat; lê gava ko di têgihiştina nivîsa li ser kaxizê de zehmet kişand, vê carê bala xwe bêtir dayê. Kir û nekir, tiştek ji nivîsê fahm nekir. Li dora xwe niherî, got belkî hinek ji qazî weha dikin; lê gava dît ko herkes di halê xwe de ye, berê xwe da pencereyê û ponijî. Piştî ko hebekî din jî fikirî lawikê bîstika din ko li kêleka wê rûniştibû hat bîra wê. Erê erê, ev kaxiz hebe tune be, ji wî ketiye. Ji ber ko lênûskek jî di destê lêwik de bû. Gava ko nuh li cem wî rûniştibû bala xwe dabûyê. Di dilê xwe de, dîsa got ko ev kaxez ji wî lawikî ketiye.
Lê di vê nivîsê de, çi tê gotin gelo? Jê re bû meraq...
Dîsa kaxiz vekir û lê niherî. Tiştê ko di kaxizê de hebû, helbestek bû; ji rêzikan tê derxistibû. Ev ne bi tirkî hatibû nivîsandin, bi zimanekî din bû. Di vê helbestê de, çi dihat gotin gelo?
Bi dû re, Robîn anî bîra xwe. Wê ew gelek caran di otobusan de didît ko pirtûkan dixwîne, an jî tiştinan li lênûska xwe dinivîsîne. Çend caran weha li hevdu jî niherîbû. Gava ruyê wî anî ber çavên xwe û li kaxeza destê xwe ko meraq dixist dilê wê fikirî, meraqek li ser Robîn jî di dilê wê de şiyar bû. Ji xwe re got »gava min ew dîsa dît, ez ê ji wî bipirsim, bê ka

di vira de çi nivîsandiye,« û kaxiz pêça û xist bêrîka xwe.
Gulcanê rojên dinê her li Robîn geriya. Dizanîbû ko Robîn li nêzîkî mala wan rûdinê, lê nizanîbû, bê ji kîjan rawestgehê li otobusê siwar dibe. Ji ber wê, hema li rawestgeha nêzîkî mala xwe li benda otobusan disekinî û ji derve bi hêviya ko wî bibîne çavên xwe li hindurê otobusan digerandin. Her gava ko li otobusekê siwar bibûya, berî ko têketa hindur, çavên xwe li wî digerandin. Lê her ko rojek din bi ser diket, hêviya wê
53
REŞ Û SPÎ

hindiktir dibû, pê re jî bala wê bêtir diket ser Robîn û jê re dibû kul. Piştî wê rojê bi hefteyekê bû, Gulcanê êdî hêviya xwe birrîbû û çendekî jî ji bîr kiribû. Lê hê jî beyî xwe li wî digeriya. Robînê ko bi wendabûna helbesta xwe hisiyabû, lê nizanîbû bê li kû ji wî ketiye û zêde jî guh nedabû wendabûna wê helbestê, dîsa di otobusê de berê xwe dabû pencereyê
û diponijî.
Dinya germ bû, hewa hindurê otobusê mirov gelekî aciz dikir. Gava Gulcanê li otobusê siwar bû û çav li Robîn ket, ji nişka ve, mîna ko çav li hevalekî xwe ketibe, kêfa wê hat û ber bi wî ve meşiya.
Robîn di serî de, li wê hay nebûbû. Lê piştî dît ko dîsa ew keçik ber bi wî de tê, heyecaneke eynî mîna wê rojê, dîsa xwe li wî girt. Tevzînokên germ li paş stuyê xwe his kir.
Keçik bi serê lêvan bişirî û bi awayekî ko Robîn ecêbmayî bihêle, samîmî û bi çavên dawetkar lê niherî û bi dengekî nermik got:
— Merheba.
Herçî Robîn bû, hew dizanîbû, bê dê çi bikira. Wî ev keçika ko berê jî carcaran di otobusê de didît, nas kiribû. Lê tu carî bi hevdu re

nepeyivîbûn. Got qey ew ji berê de hevdu nas dikin, lê nayê bîra wî. Bi lez fikirî. Dest û lingên wî li hev geriyan. Ket ber fediyê, lê nehişt ko keçik pê bihise û tavilê bersiva silava wê da:
— Merheba.
Herdu jî bi hev re bişirîn. Robîn bêtir fedî kiribû û xwê dabû. Bi dû re, bala xwe da porê wê. Bi qasî ko dihat bîra wî, porê keçikê, berê dirêjtir bû.
Lê tiştê ko niha ew ecêbmayî hiştibû, ne ev bû. Digel ko gelek paldankên din jî vala bûn, keçik hatibû li kêleka wî rûniştibû û silav jî dabûyê. Gulcanê tavilê xwe da ser hev, ji bo ko vê fersendê ji dest nerevîne, hema bi lez li bêrîka xwe geriya, kaxizek ji bêrîka xwe ya dawiyê derxist û dirêjî Robîn kir.
— Ev çend roj in ko ez li te digeriyam.
Robînê ko ji xwe ecêbmayî mabû, bi vê peyvê çavên xwe qels kirin û bi tirs xwe da bende. Di serî de, tiştê ko hat bîra wî, ew bû ko ev keçik ji bo tiştekî nebaş li wî digere. Wî tiştek xerab bi vê keçikê nekiribû. Na, heke ne weha be, ma ew ê çi karê wan bi hev re hebe..?
Keçikê dîsa li çavên wî niherî û dewam kir. Robîn fedî dikir li çavên wê binere.
— Wê rojê, te ev kaxiz li şûna xwe hiştibû. Belkî jî ji te ketibû, ez nizanim. Lê min ew dît û gava min fahm kir ko ya te ye, min got belkî ez dîsa
54

te bibînim û min veşart.
Ji aliyekî jî kaxiza di destê xwe de vedikir û ber bi wî ve dibir. Robîn gava çav li kaxizê ket û nas kir, bêtir ket fediyê û tavilê rahiştê. Piştî ko hebekî lê niherî, li wê zivirî. Dîsa beyî ko li çavên wê binere, mîna ko di ber xwe de bipeyive, got:

— Ha! Belê belê, ya min e. Ji min ketibû. Ez jî lê digeriyam.
Keçikê peyva wî birî. Disa bi wî dengê xwe yê kubar û nermik, got:
— Min çi qasî lê niherî jî min tiştek jê fahm nekir.
Ji nişka ve, bêgengiyekê xwe li wan girt. Robîn lal bûbû. Hew dizanîbû, bê ê çi bigota.
Robîn helbest di dilê xwe de dixwend û hey li wê diniherî. Nikarîbû tiştek bigota. Xwe dabû benda wê. Keçikê jî weke ko hertişt fahm kiribe, hew tiştek pirsîbû. Carê li wî diniherî û bi dû re dîsa çavên xwe bi meraq dadigerandin ser kaxeza di destê wî de. Robîn dê piştî wê, ji xwe re bigotaya:
— Ez ditirsiyam ko ji min bipirse, bê ka ev bi kîjan zimanî ye. Lê, keçikê qet tiştek nepirsî. ko bipirsiya jî min nizanîbû, bê min ê çi bersiv bidayê. Carê, mîna ko ji wê helbestê têgihîştibe, di qoziya çavên xwe re li min diniherî. Min dizanîbû ko têkîliya min û vê keçikê, bi wê demê ve girêdayî ye. Ji lewre, min jî qet dengê xwe nekir û ez bi heyecan li benda wê mam. Min nizanîbû, bê çi difikire jî. Heke tiştek bigotaya, wê dê dilê min jî rehet bikiraya. Ez him ditirsiyam, him jî min meraq dikir. Bes, tiştek hebû ko divê ez li xwe mukir bihatama; kêfa min pir ji wê re hatibû û min nedixwast ko tiştê ez difikirîm, biqewimiya.
Tiştê ko Robîn jê ditirsiya, pêk nehat. Bes heta ko dema daketina keçikê nehat jî dilê wî rehet nebû. Gulcanê dê heta ko daketaya, nepeyiviya û carê li kaxiza di destê wî de biniheriya û biponijiya; carê jî dîsa di qoziya çavan re li wî biniheriya. Bi dû re, bi awayekî ko ew ê Robîn jî bi dû re ji xwe re bigotaya, keçikê ji bo ko ew dîsa hevdu bibînin, dê civanek bidaya wî û daketaya:
— Ez ecêbmayî mam. Ez sed salî bifikiriyama jî ev îhtîmal nedihat bîra min. Ji ber ko yê min, ez li benda reaksiyoneke cidatir bûm. Tu carî tiştekî weha bi serê min de nehatibû. Keçik berî ko dakeve li min zivirî û

got, »heke tu bixwazî, em hevdu bibînin.« Mirov digot qey her tişt ji berê de di serê xwe de plan kiribû û niha jî tedbîq dikir. Ez aniha ji kê re bibêjim, bawer nake û ew ê henekên xwe bi min bike. Ew ê ji min re bibêjin tu zêde li filîmên tirkî temaşe dikî. Roja din, me hevdu dît. Roja

pey wê jî. Hema ez dikarim bibêjim ko hindik mabû min evîn ji bîr bikiraya, ji nû ve ez hatim ser hişê xwe. Piştî şeş salên min ên li Stenbolê, ev cara yekem bû ko min bi destê keçikekê digirt.

11. Her evînek bi janekê ye...

Baran dibariya, lê dinya ne sar bû; ji xwe li vî bajarî mirov nizane bê kengî dinya sar e û kengî germ e. Gulcanê, dîsa wî etekê xwe yê reş û fireh ko dadiket heta ser çongan, li xwe kiribû. Herdu guhên qutikê xwe yê belek ko bişkokên wî vekirî jî dîsa li ser nava xwe girê dabûn û zikê xwe heta navê li derve hiştibû.

Baranê tam li wan kiribû. Şil û pil bûbûn. Beyî ko guh bidin baranê, wan hevdu himbêz kiribû û dimeşiyan. Di bin wê baranê de, ji wan pê ve tu kes li derve nemabû. Li dûrî wan, di hindurê bufeyê de, zilamekî dengê teyba xwe rakiribû û li muzîkê guhdarî dikir. Behr belkî piçekî bi têsîra baranê be jî har bûbû û hey xwe bi hengameyeke mezin li zinarên ko li kêleka peravê hatibûn rêzkirin dixist. Digel ko hê nebûbû ‘esir jî ezman mîna ko evar be, tarî bûbû. Bayekî cemidî hebû. Ji der û dorê bêhna payizê dihat.

Gulcanê porê xwe yê şil bi destê xwe bi şûn de avêt û serê xwe rakir. Dilopên baranê li ruyê wê diketin. Çavên xwe ji ber baranê bi dijwarî vekirin, li wî niherî û got:

— Ew helbesta wê rojê tê bîra te?

Herçî Robîn bû, gava ko dîsa behsa wê rojê bû, ruyê wî yê ko ji ber baranê şil bûbû, sor bû û di ber xwe de bişirî.
— Belê. Tê bîra min.
Keçikê dîsa bi wî dengê xwe yî ko hişê mirov ji serê mirov dibir û bi awayekî ko mirov nikare dilê wê bihêle, xwasteka xwe got:
— Tu dikarî wê ji min re wergerînî û bixwînî?
Robîn him hebekî fedî kiribû, him jî kêfa wî hatibû. Gulcanê bi xwasteka xwe, romantîkiya xwe dabû dest. Xuya bûbû ko ew jî mîna wî diltenik bûbû. Ji ber vê yekê jî tiştên li ser evînê dilê wê bêtir dilerizand. Belkî ya ko ew bêtir nêzîkî hevdu kiribû jî ev bû.
— Baş e.
Gulcanê, tavilê lê zêde kiribû:
— Bes, divê gava te wergerand, tu wê neguherînî.
Robîn beşek ji wê helbestê wergerand û bi giranî xwend. Herçî
56

Gulcanê bû, piştî ko Robîn xwendina helbestê qedand jî mîna ko hê guh-darî dikir, li wî niherîbû. Ji derveyî dengê wî, tu dengê din nedibihîst. Ne dengê baranê, ne yê pêlên harbûyî û ne yê tiştekî din. Mirov digot qey guhên wê ker bûne û êdî şiyana xwe ya bihîstinê wenda kiriye. Bi çavên xwe yên xemgîn, beyî ko tiştekî bibêje, bi awayekî jixweveçûyî, li wî ni-herîbû û bi dû re jî serê xwe danîbû ser milê wî.
Robîn piştî ko ev rewşa wê dît, mîna ko di xewneke xweş de be û li ber serê wî melodiyek ko wî serxweş bike lê bikeve, bi tevgerên giran, ser û çavên wê bi destên xwe paqij kir û ew himbêz kir. Germahiya canê wê di sînga xwe de his kir û mîna ko bi tayê ketibe, lerizî.
— Tu dilerizî?
Robîn tiştek negot. Ev his careke din jî gava ko bi Nûşînê re bû, ew

dabû ber xwe. Destê xwe avêt situyê wê û ew bi ber xwe ve kişand. Devê xwe xist devê wê. Di bin baranê de, carê devên xwe ji hev derdixistin û bêhna xwe distend. Sê-çar deqîqeyan bi wî awayî man. Hişên herduyan jî ji serê wan çûbûn û li tu tiştekî din nedifikirîn. Gulcanê piştî maçîkirinê, ew himbêz kir, serê xwe danî ser milê wî û beyî ko tiştekî bibêje, bîstikekê bi wî awayî sekinî.

Gava ko Robîn bêhna canê wê dikişand heta nava dilê xwe û bêtir ji xwe ve diçû, dilê wê jî bûbû mîna çemekî û ber bi wî ve diherikî.

Wê jî dê bi dû re ji xwe re bigotaya:

— Min jî bêriya vê hisê kiribû. Heta wê rojê, na; lê belê, piştî wê rojê, Robîn ji min re bûbû hêviyeke nû. Çawa dibû ko ez heta niha mabûm û min ew nas nekiribû. Ew lawikê bêdeng yê ko her di otobusan de pirtûk dixwend û tu carî jî neketibû bala min, ji min re bûbû dermanekî nedîtî. Wê gavê ez hê nû hîn dibûm: Evîneke ji dil, dermanê hemû derdan e. Kela giriyê ketibû qirika wê. Lêvên wê hêdîka li hev ketin û dengekî lerzokî ji devê wê derket.

— Helbesteke pir xweş bû.

Bi dû re, ew bêtir himbêz kir û bi dengekî lerzokî û hinekî jî fediyokî, got:

— Ez ji te hez dikim, Robîn. Ez ji te pir hez dikim.

Giriya. Robîn dîsa tiştek negot. Bes ew maçî kir û sekinî. Hêsirên wê bi destê xwe paqij kirin. Ya rastî, wî jî ji wê hez dikir. Bes, li ser vê hezkirinê, gotinek jî ji devê wî derneket. Ew ne li benda vê yekê bû. Ji ber ko wî bawer nedikir ko dîsa bikaribe dil bide keçikekê.

Bi dû re, wî ê ji xwe re bigotaya:

— Min ji wê hez dikir. Him jî ne bi qasî ko ew dikarîbû lê bifikiriya. Piştî Nûşîn, şeş sal zêdetir çêbûbûn ko min bi heyecaneke weha keçikek himbêz nekiribû. Her ko min keçikeke xweşik didît, agir bi dilê min diket. Dilê min dişewitî. Ez ji hemû dinyayê dixeyidîm. Min xeber ji xwe re didan. Gava min didît ko du kesan hevdu himbêz kiriye û maçî dikin, kulên dilê min tev radibûn. Min dixwast ko ez bi kêran bi ser dilê xwe bikevim û xwe bikujim. Ji bo ko yek ji wan keçikên xweşik ji min re bibûya yar, min xwe dixwar. Lê yek jî ji min re nebûbû qismet ko ez vê heyecanê di himbêza wê de bibînim û agirê dilê xwe vemirînim. Herçî Gulcanê bû, ew jî yek ji wan keçikan bû û wê rojê di himbêza min de bû. Bes, êdî ez baş fêr bûbûm: Herçî evîn e, heke di dema xwe de neyê, bi kêrî
tu tiştî jî nayê.
Hew peyivîn. Lê Gulcanê li hember vê bêdengiya Robîn, digel dilşahiya vê evîna xwe ya nû, xemgîn bûbû û heta ko çûbûn mala wê jî nepeyivîbû. Ev yek bala Robîn jî kişandibû û ew jî xemgîn kiribû. Di bin wê baranê de, wan heta êvarî hevdu himbêz kiribû û bêdeng meşiyabûn. Gulcanê dê bi dû re ji xwe re bigotaya:
— Ez wê rojê fêrî tiştekî din jî bûbûm ko dê hemû jiyana min li bin guhê hev bixista. Hema ez bimirama, ji min re çêtir bû. Ji ber ko ez hînî wî tiştî bûbûm ko her evînek bi janekê ye.
Herçî baran bû, gavê hûrik hûrik dibariya, gavê jî dibû mîna çemekî ko ji jorê ve xwe bera jêrê dida. Her ko baran xurttir dibû, kesên li derve, tavilê xwe diavêt quncik muncikan, an jî hindurê dikanan. Mekîneyên ko di wê şiliyê de, li bin guhên hev diketin, dikir ko hemû riyên bajêr bi saetan bên girtin.
Mala Gulcanê fireh bû, hêwaneke wê ya mezin hebû. Li hêwanê, tere-heyeke mezin û gewr di nav paldankên ko bi mesafe hatibûn rêzkirin,

raxistîbû. Li ser maseyeke cam, li qorziyê televîzyoneke ekranmezin hatibû danîn. Li kêleka maseyê, teybeke mezin hebû. Li qorziya jorê ya hêla balqonê jî argûnekî xweşik ber bi çavên mirov diket. Her der dibiriqî û bêhneke xweş ji hindur dihat. Ji paqijiya xênî diyar dibû ko zêde kes nedihat vî xaniyî.
Gulcanê tavilê çû argûn dada û derbasî odeka din bû. Robîn çû xwe da ber argûnî. Gava ko Gulcanê vegeriya, destmaleke mezin û şortekî behrê di destê wê de bûn. Tiştên destê xwe dan Robîn û ji bo ko ew jî xwe biguhere dîsa çû odeka din.
Herdu bi tenê bûn. Robîn bîstikekê di penceyê re li derve niherî. Dinya
58

tarî bû. Baran hê jî dibariya. Birûska ko ji nişka ve veda, şerqîniyek ji ezmên anî û mîna ko ezmên bike du perçe, çixêzeke rohnî pêk anî. Bi vê bûyerê re baran xurttir bû. Piştî du sê birûskên din, ceryan qut bû û her der di tariyê de ma.
Li hindur, ji derveyî ronahiya ko xwe ji êrgûn dida der û pê ve, tu ronahî tune bû. Ji lewre, wan pêwîst nedît ko tiştekî din vêxin. Ji xwe, bi vî awayî hindur xweştir xuya dibû. Robîn çû xwe li ser paldankekê dirêj kir û li wê niherî. Gulcanê jî hat, li kêleka wî rûnişt û bi destên wî girt. Serê xwe danî ser sînga wî. Robîn tiliyên xwe di nav porê wê de digerandin. Gulcanê bîstikekê çavên xwe girtin û got:
— Tu ê tu carî dev ji min bernedî, ne weha? Tu ê min bi tenê nehêlî.
Robîn ew himbêz kir û got:
— Netirse, ez tu carî dev ji te bernadim.
Piştî vê gotinê, dilê Gulcanê hebekî rehet bûbû. Hilma xwe kişand. Di ber xwe de bişirî. Gava ko dikira ji Robîn re behsa evînên xwe yên berê bikiraya, Robîn hêdîka destê xwe da ber devê wê û got:

— Hiş… Nebêje. Bes serê xwe deyne ser sînga min û min himbêz bike.
Robîn destê xwe dirêjî pakêta çixareyê kir û çixareyek jê kişand.
Gulcanê ew çixare ji destê wî girt û bi xwe pêxist. Gulpek jê kişand, hebekî ma û berda. Gulpa duyem jî kişand, çixare danî ser xwelîdankê û devê xwe xist devê wî.
Lêvên hevdu têra xwe mêjtin û hevdu di nav tevzînokan de hiştin. Bi dû re, Gulcan vekişiya, rahişt çixareyê, gulpeke din jî lê xist û dîsa bi ser wî de daqûl bû. Piştî ko wan dixana çixareyê jî li hevdu par ve kir, ji hev neqetiyan.
Robîn ew li ser piştê vexist û çendekî li wê temaşe kir. Gava hat bîra wî ko ji cerga hatiye vî bajarî bêriya tiştekî weha kiribû, hebekî xemgîn bû. Lê bi dû re bi hewleke ko dê bala Gulcanê jî bikişandaya, dê bibişiriya û destê xwe di ruyê wê de bidaya.
Qutikê wê hêdîka jê kir, tiliyên xwe li ser bedena wê gerandin û xwe bi ser wê de xwar kir. Ji alîyekî lêvên wê dimêjtin, ji alîyekî jî bi destekî xwe pêsîra wê mist dida û di kefa destê xwe de diguvaşt. Bêhna canê wê, hişê wî ji serê wî dibir. Ew gêj dikir.
Nedipeyivîn. Deng ji wan dernediket. Herduyan jî bêhna xwe ji devê hevdu distend. Wan digot qey, heke bipeyivin, ew ê hemû sêhra wê demê
bi carekê betal bibe.
Robîn heta derengê şevê, li cem wê ma. Gava, pîştî bihevşabûnên dirêj,
59
REŞ Û SPÎ

xwast ko biçe êdî, Gulcanê li ber gerîya.
— Neçe.
Wê ev di ber xwe de û bi dengekî xemgîn gotibû. Çi qasî li ber wî geriya

jî ew qane nekir.
Piştî ko ew derket, Gulcanê xwe da ber pencereyê û di pey wî re niherî. Heta ko ew bi dûr neket jî xwe ji wira neda alî. Gava Robîn êdî ji ber çavan wenda bû, Gulcanê kelogirî bû û di ber xwe de got:
— Ez ji te hez dikim, Robîn. Ez ji te pir hez dikim.
12. Gava yek têk diçe, jiyan lê diherime...
»jiyan xweş e, lê ji bo yên ko wê nas nakin...«, Alfred de Mussed
Gava ko xatir ji wê xwast û derket derve, li kolanê tu kes tune bû. Dinya sar bû. Erda ko di bin baranê de şil bûbû, dibiriqî. Lempeyên gelek malan hê nehatibûn vemirandin. Ji dengê motor û qorneyên mekîneyan pê ve, tu deng ji der û dorê nedihat.
Li rawestgehê, li otobusê siwar bû. Ji ber ko dereng bû, mekîne vala bû. Çû li dawiyê rûnişt. Di camê re li derve niherî. Tiştek nedît. Lê ji nişka ve, perdeyeke tarî pêşiya wî girt. Ber çavên wî bi carekê reş bû. Destên xwe birin ber çavên xwe. Berçavka xwe peland. Zivirî, li hindurê otobusê niherî. Dengê rêwiyan dihat wî, lê belê, tu tişt nedidît. Bêhna wî çikiya. Otobus carê disekinî û dîsa dimeşiya. Deriyên wê bi gurmînî vedibûn û dihatin girtin. Dengên lingên rêwiyan dihatin wî. Li aliyê dengan dizivirî, lê dîsa tu tişt nedidît. Otobus dîsa disekinî, deriyên wê dîsa vedibûn û dihatin girtin û dîsa dimeşiya.
Nizanîbû, bê divê çi bikira. Otobus çar caran sekinîbû û deriyên xwe vekiribûn û girtibûn. Ger weha bûya, diviyabû ko li rawestgeha dîtir daketa û ji bo wê jî divê tavilê rabûya, biçûya ber derî û pê li bişkokê bikira. Heke li cihekî din daketaya, îcar wî dê xwe bi vî halî çawa bigihanda malê?
Tiştê ko hat bîra wî, ew tirsand. Ji nişka ve venihurî û bi dû re xwast xwe bi lez bigihîne ber derî. Lê dikir û nedikir, nikarîbû bilezanda. Ji ber vê yekê, destê xwe bilind kir û xwe bi hesin ve girt û bi vî awayî hêdî hêdî

ber bi derî ve meşiya. Li bin guhê zilamekî ket. Zilêm jî hema ew dahf da û bi hêrs bang kir:
— Ma qey tu kor î, birê min! Li pêşiya xwe binere, yaho. Tu dibêjî qey
60

tu ji serê çiyê hatiyî!
Robîn ket erdê. Tew di nav wê keft û leftê de, berçavka xwe jî ji çavên xwe xistibû. Otobus hê jî dimeşiya. Yên ko li wî diniherî, digot qey Robîn serxweş e. Mêrik dît ko nikare rabe ser xwe, mahdê xwe tirş kir, bi çengê wî girt û ew rakir. Yekî din jî tavilê daqûl bû û rahişt berçavka wî, da destê wî. Digel ko Robîn dizanîbû, berçavk bi kêrî tu tiştekî nayê jî ji destê mêrik girt û xist çavê xwe. Nizanîbû, bê ev mirovên ko alîkariya wî dikin, kî ne jî. Bi dû re, dîsa ew dengê hov seh kir û veciniqî.
— Te xêr e, birê min? Ma tu serxweş î?
Robîn tavilê bi tirs bersiv dayê:
— Na, na! Ez ne serxweş im! Ber çavên min reş bûye. Ez nikarim tiştekî bibînim.
— Heke tu kor bî, tu çima derdikevî derve, birê min? Ma vê saetê, çi karê te li derve heye?
— Ez ne kor im, lawo! Ma ne min got, ber çavên min reş bûye.
Robîn hilma xwe sitend û berda. Piştî ko bêhna wî hebekî hat ber wî, pirsî:
— Em li kîjan rawestgehê ne?
Dîsa wî dengê hov bersiv da:
— Lastîkçî.
Robîn destê xwe rakir û bi heyecanekê:
— Hah! Temam! Ez ê li vira dakevim!
— Temam, temam. Ez ê jî li vira dakevim. Ka bêhna xwe fireh bike, ez

ê bi te re dakevim. Netirse, ez ê alî te bikim.
Herdu bi hev re daketin. Barana ko kêm bûbû, hûrik hûrik xwe li ser û çavên wan digirt. Dinya cemidîbû.
Mêrik ket milê wî. Robîn nizanîbû, bê ew bi kû de diçin. Le ko mêrik ew bibira cihekî din?
Meşiyan. Qet bi tu aliyî de nezivirîn û rast meşiyan. Carê lingên wî li kevir meviran diketin. Mêrik nedipeyivî. Wî Robîn her bi xwe re dikişk-işand.
Ev zilam kî bû? Ji kû bû, gelo? Baş bû, an xerab bû? Ew bi kû ve dibir?
Ev pirs hey di serê wî de digeriyan. Xwast ko ji zilêm tiştekî bipirse. Devê xwe livand, lê peyv ji devê wî dernediket. Herçî yên ko derdiketin jî tev li hev dibûn:
— Abba… exxiy… ba… ba… iy…
Çi qasî hewil da xwe jî nikarîbû bipeyiviya. Destê xwe yê vala li destê
61
REŞ Û SPÎ

zilêm xist, da ko bala wî bikişîne. Herçî zilam bû, qet guh nedida wî û ew bêtir dikişkişand. Li erda şil, çi kortik, cihok û kevir hebûna, ew li wan diqeliband û dikişkişand. Kincên wî di nav heriyê de mabûn. Her derê wî diêşiya. Ji lingên wî yên ko li kevir meviran diketin, xwîn diherikî. Ji êşa canê xwe diqêriya, lê dengê wî dernetiket û zilêm jî qet guhê xwe nedida vê rewşa wî.
Zilam ji nişka ve sekinî. Robîn di kortalekê de berda. Kortal tije av bû. Robîn xwe da ser destê xwe û rabû. Kincên wî tev de lewitî bûbûn. Ji niş-ka ve, tiştek li ber çavên wî teqiya û ronahiya ji wê teqînê derket, xuya bû.
Çavên xwe girtin û vekirin. Çavên wî didît!

Hema berê xwe da zilêm û qêriya:
— Ma qey tu dîn î!
Hemû dengê xwe bi wê qêrînê re berda. Wê gavê, zilêm tavilê kêreke mezin ji paş xwe kişand û da qirika wî. Herdu destên Robîn li hewa man. Nikaribû xwe bilivanda. Bêhna wî çikiya. Xwîna wî sekinî. Rengê ruyê wî hat guhertin. Dikira ji tirsa xwe bifetisiya.
Zilêm bi kêra destê xwe qirika wî jê kir. Herçî Robîn bû, hewil da xwe û bi hemû hêza xwe qêriya.
— Hahooo...!
Şifêr bi qêrîna wî re, got qey pê li tiştekî kiriye û ji ber vê yekê, tavilê pê li firênê kir û li dora xwe niherî. Mekîne bi carekê ve sekinîbû. Rêwiyên ko ji bo li bin guhê paldankên pêşiya xwe nekevin xwe hişk bi hesinan girtibû jî piştî ko ji nû ve xwe da ser hev, bi tirs li dû xwe zivirîbûn. Dengê şifêr î hov hat bihîstin:
— Çi bû, birê min? Xêr e? Ma ev çi warwara te ye?
Robîn li dora xwe niherî. Herkesî bi çavên tije meraq li wî diniherî û di nav xwe de dipeyivî. Ket ber fediyê. Ruyê wî sor bûbû. Bi dû re serê xwe rakir û got:
— Bibuhurin. Ez di xew de bûm. Min beyî hemdê xwe bang kir.
Şifêr serê xwe bi hêrs kil kir û dîsa pê li xazê kir. Robîn rabû ser xwe û çû ber derî. Ji bo ko ruyê xwe veşêre, serê xwe bera ber xwe dabû. Otobus li rawestgehê sekinî, deriyên wê yên dawiyê vebûn û Robîn daket.
Herçî Robîn bû, wî ê bi dû re ji xwe re bigotaya:
— Ev cara duyem bû ko ez ewqasî ji mirinê tirsiyabûm. Ma gelo însanê ko bi rastî kor be jî di wê rewşê de, tu carî dikarîbû bi qasî min bitirsiya? Min wê rojê jiyana kesên kor jî nas kiribû û êdî min dizanîbû, bê ew her roj bi kîjan tirsan dijîn. Ji lewre, ji wê rojê û bi şûn de, her ko min korek
62

didît, dilê min bêtir pê dişewitî û min dixwast ko ez alî wî bikim.
Xwe bi zorê gihand malê. Herkes di xew de bû. Ji ber ko gelek caran weha dereng dihat malê, herkes fêrî vê adeta wî bûbû. Ji bo ko wan şiyar neke, derî hêdîka girt û çû ser nivînên xwe.
Bi tenê Leyla Xanima diya wî, heta ko dengê derî nehatibûyê, xew neketibû çavên wê. Piştî têgihişt ko Robîn hatiye, dilê wê rehet bûbû, hêdîka xwe bi ser kêlekê de zivirandibû û ketibû xewê.
Wê şevê, heta ko xwe ji têsîra wî kabûsî xelas kir, di nav nivînan de xwe bi vî aliyî û wî aliyî de qulipand. Paketeke çixare kişand. Xew neket çavên wî. Serê wî her diêşiya û zingînî ji guhên wî dihat.
Bi dû re, wî ê ji xwe re bigotaya:
— Piştî van kabûsan, şev û rojên min giş tev li hev bûbûn. Min nizanîbû, bê çi bi serê min de hatiye. Ji xwe derdê min ne besî min bû, îcar ev kabûs li serê min bûbûn bela. Êdî min nizanîbû, bê kîjan kabûs e; kîjan ne kabûs e jî. Ji ber van kabûsan, min gelek caran xwast ko ez xwe bikujim, lê belê, min tu carî cesaret nekir. Mezintirîn jana ko ez ji ber ne di tu halî de bûm jî ev bû.
13. Jiyana hemû kesên têkçûyî dişibe hevdu...
»Ma kesek heye ko kul û kederên wî tune be?«, Firdewsî
Ro dihat nîvro. Robînê westiyayî di odeka xwe de di xew de bû. Ji xwe, ber destê sibehê dengê kuxika wî hatibû. Yên malê, ji ber ko dizanîbû, ew dereng hatiye malê, ew şiyar nekir.
Binevşê derî li xwe girtibû. Li odeka xwe li hember neynikê rûniştibû û li xwe diniherî. Serdar ji bo ko hevaleke xwe ya keçik bibîne, derketibû derve. Meryem ji xwe re li ber televîzyonê rûniştibû. Resûl Beg li odeka xwe ji xwe re doşekek danîbû û veketibû, li teybê guhdarî dikir. Herçî Leyla Xanim bû, li hêwanê sifreyek raxistibû, neh-deh şûşe danîbûn ber

xwe û bahcanê sor, bahcanê reş û fasûliyê şîn dadigirtin.
Robîn çavên xwe vekirin, bawişkî, xwe vezeland û li saeta xwe niherî. Weke ko dereng mabe, bi lez rabû ser xwe û kincên xwe li xwe kirin. Çû serçavê xwe şuşt û hat, rahişt berçavka xwe. Wê gavê Leyla Xanima ko bala xwe dabû vê lezandina wî, rabû ser xwe û jê pirsî:
— Xêr e, Robînê min? Tu bi kû dediçî?
Robîn beyî ko li wê bizivire, tavilê bersiv dayê:
63
REŞ Û SPÎ

— Divê ez bigihêm cihekî, dayê.
Leyla Xanimê bi gazin gotê:
— Ma te hê taştê jî nexwariye, lawo! Me bizanîbûya, me ê tu piçekî zûtir şiyar bikiraya, kurê min.
Robîn gava sola xwe dixist lingên xwe got:
— Xem nîn e, dayê. Ez dikarim li derve jî li ser lingan tiştekî bixwim. Niha, divê ez derkevim.
Bi lez ji malê derket û ket asansorê. Li ber neynika asansorê, porê xwe yê nîvşilbûyî bi destên xwe rast kir û li xwe niherî. Gava ko da ser riyê, wî jî nizanîbû, bê ew ê bi kû de biçûya. Ji lewre, di dilê wî de, him valahiyek, him jî meraqeke berlênayêgirtin hebû. Bi gavên mezin û weke ko dixwaze xwe zû bi zû bigihîne cihekî, bi lez dimeşiya. Piştî hebekî din jî lezand, dest bi bazdanê kir. Mirov digot qey dabû pey hinekan.
Wî jî nizanîbû, bê bi kû dediçû. Di dilê wî de, teşqeleyeke mezin hebû. Wî digot qey ji bo çûna deverekê dereng mabû û her direviya. Lê çi qasî hewil dida xwe jî nedihat bîra wî ko ji tu kesan re gotibû »em ê hevdu bibînin.« Ji lewre, gava ko baz dida, carê ji xwe re digot, »ma gelo ez bisekinim« û diket nava teşqeleyeke din. Di nav van ramanan de heta

rawestgehê, beyî ko li devereke din bisekine, baz da.
Gelek caran li wî weha hatibû. Beyî îradeya xwe derdiket û digeriya. Çi cihên ko nas nedikirin hebûna, diçûyê. Heta ko li wî dibû êvar, li wan deveran rûdinişt û çavên xwe bi hêviyeke ko tu carî nediqediya li dora xwe digerandin. Digot qey hinekan ji wî re gotibû; were û ew jî ji ber vê yekê çûbû wira. Belkî jî ev tev de fantaziyên wî bûn. Ji lewre, hercar destvala û stuxwar vedigeriya malê û li ber vê rewşa xwe diket. Carinan jî digot qey dîn bûye û dilê wî bêtir bi wî dişewitî.
Du otobus hatin, li rawestgehê sekinîn û dîsa riya xwe domand. Robîn nizanîbû çima, lê li herduyan jî siwar nebû. Otobuseke din hat, li ber wî sekinî û deriyên wê yên pêşiyê vebûn. Robîn li şifêr niherî. Şifêr zilamekî qelew î kal î porsipî bû. Bi destê xwe işaretî Robîn kir ko siwar bibe. Wê gavê, weke ko şîrmaqek xwaribe, hat bîra wî ko ji malê bê pere derketiye. Valahiyek di dilê xwe de his kir. Xwe mîna ko xwarî erdê bûbe his kir. Robîn çû ber derî û bi awayekî fediyokî got:
— Bilêta min tune ye.
Şifêrê qelew î kal, weke ko bibêje »tişt pê nayê« dîsa eynî işaret kir. Robîn sipasî wî kir û siwar bû. Digel ko otobus vala bû jî gava ber bi dawiyê ve diçû, ji nişka ve li ortê sekinî û li xwe zivirî. Çav li xortekî
64

ketibû. Du-sê gav bi şûn de avêtin û hat ber lêwik û bala xwe dayê. Robîn veciniqî. Çavên wî fireh bûn. Belê. Ew bi xwe bû. Bişar bû.
Vî tiştî bala Bişêr jî kişandibû. Wî jî serê xwe rakiribû û li wî diniherî. Herçî Bişar bû, ruyê wî fireh û çavên wî kortçûyî û piçûk bûn. Porê wî yê xelek xelekî tev li hev bûbû. Xuya bû, ev çend roj bûn ko wî jî rîha xwe kur nekiribû. Herduyan jî mîna mirovên ko nizanibin bê ji kû hevdu nas dikir ziq li hevdu diniherî û mîna li hêviya hev bin ko yek ji wan dest bi

peyvê bike, sekinîbûn. Bi dû re, Robîn hêdîka xwe bi hesinê paldanka wî girt û bi dengekî nizm, bi tirsa ko ew jî nizane bê ew ê çi bersivê werbigire, got:
— Ez dikarim tiştekî ji te bipirsim?
Bişar jî bi qasî wî şaş bûbû. Çavên xwe qels kirin, xweziya xwe daqurtand û got:
— Heke tu bixwazî, ka ji kerema xwe re bisekine, ez ji te bipirsim.
Robîn beyî ko tiştekî bibêje, di cihê xwe de sekinî.
Lêwik pirsî:
— Te jî ew kabûs dîtin, ne weha?..
14. Ez tu me, tu jî ez…
»Di her mirovî de hemû rewşên mirovahiyê hene...«, Montaigne
Robîn di pencereyê re li derve diniherî. Dinya tarî bûbû. Baran hey dibariya. Kolan tev şil bûbûn. Li herdu aliyên riya jêrê, kortal tije av bûbûn. Mekîneyên ko diçûn, xwe li kortalan dixist û av dipejiqandin dora xwe. Du kesên ji bo xwe ji ba û baranê biparêzin di bin sîwaneke reş de
ketibûn milê hev, bi lez û bi gavên mezin dimeşiyan. Bayê ko xwe li sîwana wan dixist û carê ji ser serê wan dida alî, darên mezin ên li kêleka riyê jî dihejandin.
Piştî bîstikekê, vegeriya û çû li ser paldanka dirêj ya li hember Bişêr rûnişt. Herçî Bişar bû, du caran li Robîn bû. Qama wî pir dirêj bû. Robîn li cem wî mîna zarokekî xuya dibû. Destên xwe li ser sînga xwe danîbûn ser hevdu û li hember argûnê ko hindur dikir weke tenûrê lingên xwe li erdê dirêj kiribûn. Ji cerga ko hatibûn, ev çixareya çaran bû ko li ser hev dikişand.
Bişêr weke ko ji hinan veşêre, bi dengekî nizm got:
— Ev çî te ye, lo?

Û bi serê xwe û birûyên xwe ve medbex îşaret kir.
Robîn got:
— Hevala min e.
Piştî ko piçekî fikirî, lê zêde kir:
— Keçikeke baş e.
Gava ko Gulcanê bi siniya destê xwe ya ko sê fîncan qehwe û qedeheke av li ser bûn, ket hindur, herduyan bi hevdu re dengê xwe birî û bala xwe da wê. Rewşa wan bala Gulcanê jî kişand û têgihişt ko ew li ser tiştekî dipeyivîn û hatina wê bûye sebebê ko dev ji mijarê berdin. Her yekî ji wan rahişt qehweyekê. Gulcanê jî tevî siniya destê xwe li kêleka Robîn rûnişt û bala xwe da wan.
Piştî ko qehweyên xwe vexwarin û herkê çixareyeke din pêxist, dîsa dest bi peyvê kir. Robîn bêtir li wî guhdarî dikir. Bişar ji wî zêdetir dipeyivî û gava ko dipeyivî jî her li ber xwe diniherî û serê xwe bi kerb kil dikir. Li ser hev çixare pê dixistin. Xwelîdanka ber wî bi boçikên çixareyan tije bûbû. Ji bo ko meseleya xwe baştir bide fahmkirin, carê destên xwe jî bi kar dianîn. Carê jî li Gulcanê diniherî û digot, hela bê fahm dike, an na. Bi dû re, dîsa li Robîn dizivirî û peyva xwe didomand.
Carekê, weke ko li hember pirsgirêkekê neçar bimîne, destên xwe bi herdu aliyan de rakirin û daxistin. Kesereke kûr kişand û ma. Bîstikekê deng ji wî derneket. Bêdengiyek li hindur çêbû. Piştî ko hebekî fikirî, Robîn ew bêdengî xera kir û dest bi peyvê kir.
Herçî Gulcanê bû, ji ber ko ew bi kurdî dipeyivîn, wê tiştek ji devê wan fahm nedikir. Carê li Robîn diniherî, carê jî li Bişêr. Ji ber ko Bişar carê di nav peyvê re, weke ko gumanan ji wê dike, li wê diniherî, an jî bi wê

weha dihat, hebekî ji wî tirsiyabû. Dîsa jî dengê xwe nedikir û beyî ko tiştekî ji wan fahm bike, bi çavên tije meraq, bala xwe dabû wan û guh-darî dikir.
Bi dû re, wê ê ji xwe re bigotaya:
— Robîn li ser Bişêr gotibû »hevalekî min e« û ew bi min dabû naskirin. Lê belê, ne bi qasî ko hevalê hevdu bin, bi hev re dipeyivîn. Min dizanîbû ko tiştek di navbêra wan de hebû, lê min nizanîbû bê çi bû. Herçî Bişar bû, ne bi qasî Robîn kubar bû. Gava ko dipeyivî, carê di qorziya çavan re li min diniherî. Lê bi qasî ko min bala xwe dabûyê, ne yekî dilxerab bû û Robîn pir qîmet didayê. Ji peyva wî jî diyar dibû ko ne însanekî vala bû. Ji ber çi ewqasî bikerb bû, min têdernedixist.
Gavekê, Robîn li Gulcanê niherîbû û lê hay bûbû ko ew aciz bûye, peyv
66

guhertibû û bi tirkî dewam kiribû. Lê gava ko xwe ji bîr kiribû, dîsa veg-eriyabû ser kurdî. Gava ko Gulcanê di ber xwe de bi vê rewşa wî keniyabû, bala wî jî kişandibû. Ketibû ber fediyê. Ruyê wî hebekî sor bûbû.
Piştî ko peyva xwe xelas kir, li wê zivirî, bişirî û got:
— Me tu pir bi tenê hiştî, ne weha? Ez dibêjim, tu aciz bûyî. Li qisûra me nenihere.
Gulcanê ji bo ko wan nexe ber şermê, tavilê got:
— Na, na! Ne ewqasî jî.
Ji bo ko bi wê re jî peyivîbûn, kêfa wê hebekî hatibû cih. Robîn û Bişar piştî bi qasî pênc deqîqeyan bê deng man û di wê navê re qehweyên xwe vexwarin, dîsa ketin peyvê. Lê vê carê, ji bo ko Gulcanê jî tev li suhbeta xwe bikin, bi tirkî dipeyivîn. Gulcanê jî rabû xwelîdankên ber wan vala kirin û çû ji wan re fêkî anî.

Bişêr rahişt sêvekê û got:
— Herçî jiyan e, her ko diçe, bêtir diherime. Têkîliyên germ nemane. Insan ji hev pir bi dûr ketine. Hevaltî mevaltiyên mîna berê jî nemane.
Rawestiya. Li Robîn û Gulcanê niherî. Keserek kişand. Wê gavê,
Robîn çixareyeke nû pê dixist. Bi dû re dewam kir:
— Carinan ez dibêjim qey evînên berê jî tevde derew bûn, lê ez bawer nakim ko weha be. Ji ber ko di demên evînên mezin de, însan hê ewqasî fêrî zexeliyan nebûbûn.
Robîn di ber xwe de keniya û got:
— Na, lo! Ne ewqasî jî! Herçî evîn e, ji cerga ko însan hatine ser ruyê dinyayê, her hebûye. Bes her ko çûye, qîmeta xwe wenda kiriye. Ji ber ko însanan êdî heyecanin nû ji xwe re dîtîne. Ma dibe ko evînên di helbestên Fuzûlî, Ahmedê Xanî û Melayê Cizîrî de ne, giş derew bin. Ma qey çîro-ka Leyla û Mecnûn û ya Mem û Zînê, belasebeb nehatine heta îro!
Bi dû re, lê zêde kir:
— Hertişt ji pêdiviyê tête pê. Tew di vî zemanê ko mirov bêtir ber bi tenêtiyê ve dahf dide de, pêdiviya wî bêtir bi evînê heye.
Herçî mijara evînê bû, ew hebekî şên kiribûn. Ramanên wan ên li ser evînê, bala Gulcanê jî kişandibû. Lê, wê tu carî peyvên weha xweş yên ko pesinê evînê didin, nebihîstibûn. Kêfa wê jî ji vê mijarê re hatibû. Guhê xwe baştir dabû wan. Wê jî xwastibû tiştinan bibêje, lê him ji fediyan û him jî ji bo ko peyva wan nebire, nepeyivî.
Robîn got:
67
REŞ Û SPÎ

— Herçî evîn e, li gora kesan tê guhertin. (Hebekî fikirî.) Niha navê wî nayê bîra min, bes yekî gotibû; »evîn dereweke mezin e ko mirov bi wê

xwe dixapîne.« Yekî din jî gotibû; »evîn gurekî har e, çi qasî mezin be, dikarî te ewqasî bileztir bixwe.«
Hersê jî keniyan. Bişêr serê xwe bi ken jê re hejand. Bi dû re Robîn sekinî, serê xwe bera ber xwe da û fikirî. Berê xwe da Gulcanê. Destê xwe danî ser milê wê û li çavên wê niherî. Kesereke kûr kişand û got:
— Û evîn… mîna sêhezarê pinîkêr e… bi destê herî erjeng jî dikare hemû lîstikan bide qezenckirin.
Dil û hinavên Gulcanê li hember vê gotinê heliyan. Wê tiştek ji peyva pinîkêr fahm nekiribû, lê bi gotina ko bi dû wê re hat, têgihişt bê Robîn dixwaze çi bibêje. Canê wê tevizî. Lerizî. Hema xwast ko xwe biavêje stuyê wî, wî himbêz bike û heta ko ji wê bê, bigirî û dilê xwe rehet bike. Lê wê weha nekir. Wê gavê li Bişêr hay bûbû û ji wî fedî kiribû. Xwasteka wê di dilê wê de mabû. Ew jî bi xwe têgihiştibû ko êdî hew dikare dev ji Robîn berde û bi wî ve hatibû girêdan.
Piştî ko bîstikeke din jî rûniştin û şevbihêrka xwe kir, li saetê niherîn. Şev dereng bûbû. Rabûn, solên xwe xistin pê û derketin. Li derve, tu kes tune bû. Erd tevde şil bûbû. Dinya jî pir sar bû. Wan di xwe re nedît ko bi şûn de vegerin. Ji bo ko necemidin, xwe bêtir nêzîkî hev kir û ketin milên hev. Ji ber bayê cemidî, bi zorê dimeşiyan. Qerisîn. Robîn bi gazinî di ber xwe de, got:
— Xwezî me tiştek ji Gulcanê bistendaya; bi vî awayî, em ê heta malê ji sermayê biqefilin.
Mekîneyek bi lez di ber wan re bihurî. Hindik mabû ko li bin guhê wan biketa. Xwe hema bi zorê ji ber da alî. Robîn bi dû mekîneyê re, destê xwe bi hêrs rakir û qêriya:
— Hey ker lawê kera! Ma tu li ber xwe biniherî, tu ê bimirî qey! Lawo, înşaleh mekîneya te dê biqelibe û situyê te di bin de bimîne! Tu hew bikaribî bigihêjî cihê xwe, înşellah!

Bişêr bi destê wî girt û got:
— De heydê, dev jê berde, lo! Em hebekî din jî xwe biştexilînin, em ê li vira bibin qeşa, ha!
Gava ko dimeşiyan, Robîn hê jî di ber xwe de xeber dida. Heta rawestgehê jî ew hêrsbûn ji ser xwe neavêt. Ji wî aliyê rêyê, çend zilam ji kuçeyekê derketin û ber bi wan de baz da. Bi dû re, çend kesên din jî xuya bûn. Her kesek bi aliyekî de direviya. Yên ko ew dîtin, bi destên xwe
68

işaret dikir, da ko ew jî birevin. Lê belê, wan tiştek ji wan fahm nekir. Gava ko yek di ber wan re derbas bû, bang kir:
— Birevin, lawo! Birevin!
Herdu jî di cihê xwe de mat mabûn û li kesên ko bi tirs direviyan diniherî. Wan yek sekinand.
— Xêr e, heyran? Hûn ji bo çi direvin?
Zilam li paş xwe zivirî. Bi dû re, weke ko tiştek dîtibe, veciniqî û dîsa reviya. Bang jî dikir:
— Birevin, lawo! Kê bigirin dibin dikujin, welleh!
Herduyan jî tiştek ji wî jî fahm nekiribû. Li hev zivirîn. Çavên herduyan jî fireh bûbûn.
— Kabûs!!!
Dengê silehan hat wan. Piştî wê, dengê reprepa leşkeran hat. Leşkeran ber bi wan de bazda, berê silehên xwe da wan û ji nişka ve li ser wan girêda. Bû vizîniya guleyan. Gule di ber guhên wan re diçûn. Li ser serê wan bû tara bêjingê. Di wê navberê de, dengê perwaneyekê ji ezmên hat. Piştî bîstikekê, helîkopterek li jorê xuya bû. Bombe diavêt der û dorê. Dengê teqîneke ko heft xwezî bi teqîna berê hat bihîstin. Bi wê teqîna mezin re agir bi çend avahiyan ket.

Robîn û Bişêr li dû xwe nediniherî û kuçe bi kuçe direviyan. Piştî bîstikekê, gihîştin daristanekê. Derketin ser dareke mezin û gulî û pelên wê darê ji xwe re kirin sitar û xwe di nav de veşart.
Her dever tarî bû. Leşkeran dev ji yên din berdabûn û di bin daran de jî li wan digeriyan. Bi şewqekê, herduyan jî berê xwe da wî aliyê ko dengê leşkeran jê dihat. Wan dît ko sê kes li ber dîwarekî, li kêleka hev hatibûn rêzkirin û leşkeran berên silehên xwe dabûn wan. Di bin şewqa lempeya ko di destê leşkerekî de bû, ruyên hersê zilaman xuya dibûn. Hersê jî xort bûn. Tev nediliviyan. Deng jî ji wan dernediket. Yekî ji wan xortan, destê xwe yê çepê kir kulm û ber bi jorê ve rakir, serê xwe jî bilind kir û li ezmên niherî. Herduyên din digiriyan.
Çavên Robîn û Bişêr firehtir bûbûn. Herdu jî têra xwe tirsiyabûn. Ew dîmena li hember wan û dengê perwaneya helîkoptera ko li ser serê wan diçû û dihat, tev li hev dibû û tirsa wan mezintir dikir.
Xwe hişk bi guliyên darê girtibû. Dilerizîn. Diqerisîn. Tirsê ew ji halekî xistibûn halekî din. Wan digot qey ew ê aniha erd biheje û herdu dê li ber leşkeran li erdê bikevin. Lê hîn ew weha difikirîn, dengê fermanekê hat bihîstin. Wî dengê bixezeb di wê tariyê de, hem Robîn û hem jî Bişar
69
REŞ Û SPÎ

ewqasî tirsand ko herdu jî ziravqetiyayî bûn.
Sileh giş teqiyan û agirê xezebê berê xwe da sê xortan. Hersê xort ketin erdê û di nav xwînê de vegevizîn. Xortê ko bîstika din kulma xwe bilind kiribû, li erdê jî û heta ko can da jî kulma xwe sist nekir.
Helîkopterê ji nişka ve şewqek avêt ser wan û leşkeran dora wan girt. Wan jî nizanîbû bê çawa çêbû, bi tenê dît ko leşker wan dadixin. Leşkeran ew birin û dan ber wî dîwarê ko bîstika din ew hersê xort li ber

hatibûn kuştin. Çavên xwe ji ber şewqa lempeyê, bi zorê vedikirin. Tiştekî din xuya nedibû. Leşker li hember wan rêz bûn.
Dengekî xurt qêriya:
— Ateeeş!
Û sileh giş bi hev re teqiyan. Qudûmê wan şikestibû. Serê wan gêj bûbû. Ber çavên wan reş bûbû. Nava wan qetiyabû. Çongên wan sist bû û herdu jî li ser hevdu ketin erdê. Herduyan jî nikarîbû çavên xwe vekirana. Canê wan her diêşiya, lê wan nizanîbû, bê gule li kû wan ketibûn. Ji ber ko her devera laşên wan bi hev re diêşiya. Tev nediliviyan. Di cihê xwe de hişk bûbûn. Deng ji wan dernediket.
Bi dû re dengekî din hat wan:
— Robîn! Robîn!
Robîn veciniqî û çavên xwe vekirin. Li wê zivirî. Mîna ko ji binê bîreke kûr derketibe, bêhna wî çikiyabû. Him bi lez hilma xwe distend, him jî ji tirsan digiriya. Xwe avêt situyê wê û weha sekinî. Herçî Bişar bû, di şûna xwe de serê xwe bera ber xwe dabû û diponijî. Robîn di himbêza wê de dilerizî û dinaliya:
— Min bernede, Gulcan! Min bernede!
15. Bûkên nû û yên berê...
Dinya rohnî bûbû. Dengê bayê derve, dihat heta hindur. Sobeya hindur, ji êvarî de venemirîbû. Leyla Xanim ji şeveqê de rabûbû. Piştî ko nimêja sibehê kiribû, ketibû medbexê û firaxên ko ji roja berê de ketibûn ser hevdu dişuştin.
Herkes di xewê de bû. Resûl Beg ji ber ko di xwe re nedîtibû, wê sibehê jî ranebûbû nimêjê. Wî hercar weha dikir. Nexweşiya xwe jî ji xwe re dikir mahne û ranedibû. Leyla Xanimê carinan di nav malê de, qerfên xwe pê dikirin û behsa vî hawê wî dikir. Resûl Beg nîvrokî radibû, diçû destmêja xwe digirt û nimêja xwe qeza dikir. Gava ko nimêj dikir jî weke

ko hinan dabe pey wî, bi lez diçû sucdeyê û radibû ser xwe. Gava zarokên wî li wî û li nimêja wî ya ko wî di hindurê deqîqeyekê de dikir, ecêbmayî diman, mina ko ji wan re digot »guh nedinê« dikeniya û destê xwe kil dikir.

Leyla Xanim gava ko di medbexê de bi paçikekî şil fayans paqij dikirin, ji hêrsa xwe di ber xwe de digot:

— Îşev, ez ê ji Mîtanî re bibêjim; bila vê carê hestiyên wê bişkîne. Ew ê heta nîvro rakeve û ez ê tevî vî porê xwe yê spî rabim û ji wê re xizmetê bikim. Wele wele! Icar me li bavê xwe zêde kir, ha! Yê min, heta ko xwe-sa min sax bû, min nehiştibû ko ew rojekê jî destê xwe bide karekî. Gava ko ket ber destan jî min bin wê paqij dikir. Heke rojekê tiştekî weha bi me were, vê kûçikbava ha, dê li me jî nenihere û me biavêje derve, weleh! Her ko ji xwe re weha digot, bûka wê bêtir li ber çavên wê reş dibû.

Binevşê di odeka xwe ya ko deriyê wê hertim girtî bû de, di himbêza mêrê xwe de û beyî ko hayê wê ji van tiştan hebe, di xewê de bû. Heta derengê şevê, di himbêza mêrê xwe de veketibû û behsa xeyalên xwe yên li ser zaroka di zikê xwe de kiribû.

Leyla Xanimê çayê dabû ser û rahiştibû tizbiya xwe û çûbû, li hêwanê ji xwe re rûniştibû. Gavekê rabû û çû ser Meryemê nixumand. Herçî Meryema piçûk bû, di xew de hertim ser xwe kifş dikir. Digel ko hindur germ bû jî Leyla Xanim gava ko bi xwe dihisiya, ji ber ko ev êdî ji wê re bûbû tebîetek diçû ew saxtî dikir û dihat.

Piştî bîstikekê, dengê zîla saeta hindur hat. Ji odeka ko zarok lê radiketin, dengê teperepa lingan hat bihîstin. Bi dû re, deng ji saetê biliya. Deriyê odekê vebû, Mehabad jê derket û ber bi lawaboyê ve çû. Gava ko vegeriya, berê li medbexê niherî, bi dû re jî hat hêwanê. Mîna ko

dike bi hinekan re şer bike, herdu destên xwe dan kêlekên xwe û ji diya xwe re got:
— Dayê, qey te medbex paqij kiriye?
Leyla Xanimê tizbiya xwe dikişand. Serê xwe mîna ko bibêje »erê,« kil kir. Mehabadê awirên xwe tûj kirin, destê xwe ber bi odeka Mîtanî ve kil kir û got:
— Çima xanimê ranebûye?
Leyla Xanimê mîna ko hebekî dilê xwe girtibe, lê weke ko hayê wê ji tiştekî tunebe û tew ne di bala wê jî de be, got:
— Nizanim.
Mehabadê di ber xwe de kir ufe uf û vegeriya medbexê. Ji zû de ye ko

ew jî ji ber tevgerên Binevşê aciz bûbû. Carinan, gava ko li qayişkişandi-na wê û diya xwe difikirî, ji xwe re digot:
— Xwezî derfet hebûya û me ew cihê bikirana, lê belê em çi bikin. Mecbûrî...
Ji cerga ko Binevşê û Mîtanî zewicîbûn, di nav malê de dijiyan. Li malê odekek li ser hesabê wan bû, lê dîsa jî him yên malê û him jî Binevşê ji ber
vê rewşê ne razî bûn.
Di serî de tu problem di navbera wan de çênedibû, lê bi dû re, her ko bêtir hînî hevdu bûn û perda ruyê wan li hember hevdu qetiya, wan êdî dilê xwe jî ji hev digirt. Leyla Xanimê dixwast ko Binevşê jî wek dema ko ew bûk bû, ji malê re bûktiyê bike. Lê, Binevşê wek ko wê dixwast nedikir û bi serê xwe hereket dikir.
Gava Mehabad ji nû ve vegeriya hêwanê, Leyla Xanima ko hê jî tizbiya

xwe dikişand, keserek kişand û got:
— Ez dizanim, bê meqseda wê çi ye.
Mehabadê guhên xwe bi meraq miç kirin.
Diya wê dewam kir:
— Meqseda wê ew e ko em wan ji malê cihê bikin.
Mehabadê di ber xwe de kir niçe niç. Wê ji berê de bi vêya dizanîbû, lê ya ko ew li ber diket ew bû ko diya wê bi awayekî tundî li hember fikra cihêbûnê derdiket. Ne ko Mehabadê heq nedida Binevşê jî. Heke ji wê bihata pirsîn, wê ê bigotaya, bila cihê bibin. Lê belê, ji ber rewşa malê û sermiyanbûna Mîtanî, wê dizanîbû ko ev tişt niha nabe. Her çi qasî rewşa wan ne xerab bûya jî ger Mîtanî ji malê cihê bibûya, jê û pê ve dê rewş bihataya guhertin. Ji ber ko Robîn bi vî awayî nikarîbû sermiyantî bikira û wê jî bi tena serê xwe nikarîbû. Carinan, li ser vê meseleyê bi Mîtanî re jî dipeyivî, lê Mîtanî nedixwast ko nîqaşeke bi vî rengî têkeve nav malê. Wî digot, »em mecbûr in bi hev re îdare bikin.«
Leyla Xanimê dîsa dewam kir:
— Erê wele! Xweş mesele ye! Ji sibehê heta êvarî, heta ko ez vê malê didim ser hev, hal di min de namîne û vêya ko me ji nav rêxê derxist, bila ji xwe re rakeve. Tew îja zikê xwe ji xwe re dike mahne. Hingî radikeve, ew ê zaroka xwe jî di zikê xwe de bifetisîne, weleh!
Mehabadê bi gazind got:
— Ez nizanim, ez çi bikim ji we!
Leyla Xanimê di ber xwe de got:
— Zaroka wê jî zarok bûya! Xwedê kir ko keçik e!
72

Mehabadê dîsa keserek kişand û vegeriya çû medbexê. Li dema çayê niherî. Çû li deriyê wan xist û ew şiyar kirin. Dengin ji hindur hatin.

Binevşê mêrê xwe şiyar dikir. Derî vebû. Serê Binevşê di ber de, çavên wê li xew, di ber Mehabadê re bihurî û berê xwe da daşirê.
Zikê wê mezin bûbû, êdî bi temamî xuya dikir. Ruyê wê, dibe ko ji ber wî halê wê be, hebekî werimîbû. Herçî Mehabadê bû, di pey wê re, ji hêr-sa xwe dev li lêva xwe kir û serê xwe kil kir. Gava ko Mîtanî jî ji odekê der-ket, ji bo ko kincên xwe li xwe bike, çû odeka xwe.
Gava sifre hat danîn, zarokên din jî şiyar bûbûn. Hew Robîn û Resûl Beg di xew de mabûn. Leyla Xanim li hêwanê, berdilka Meryemê li wê dikir. Porê wê ji paşiyê ve hûnabû. Herçî Serdar bû, berî Meryemê rabûbû, bedlê xwe yê reş ko ji êvarî de hatibû ûtîkirin li xwe kiribû û li ber neynika lawaboyê porê xwe jole dikir. Di ber re jî ji xwe re difîkand. Qutikekî spî yê dibiriqîne, di bin êlegê bedlê wî re xuya dibû. Qirewateke sor xistibû situyê xwe û rîha xwe jî kur kiribû.
Li ser sifreyê, zêde nepeyivîn. Lê dengê kenê Meryemê ko henekên xwe bi porê Serdar î jolekirî dikir, dihat bihîstin. Serdar jî carê tepek li serê wê dixist, da ko wê bide sekinandin. Mehabad jî bi wan dikeniya.
Taştiya xwe xwar û berî ko derkeve, Mîtanî ji diya xwe re got:
— Yadê, min pere daye Binevşê, îroj tu û ew biçin nexweşxaneyê.
Leyla Xanim berî ko bipeyive, di bin çavan re li Binevşê niherî û got:
— Xêr e? Çî wê heye?
Mîtanî ruyê xwe hebekî tirş kir, serê xwe bera ber xwe da.
— Ez nizanim. Do verişiyaye. Dibêje, ez ne baş im.
Wê gavê, Leyla Xanimê berê xwe da Binevşê û weke ko bi wê re bix-eyide, got:
— Ma çend mehên te qediyane, lê?
Binevşê ket ber fediyê. Ruyê wê hebekî sor bûbû. Serê xwe bera ber xwe da.
— Şeş meh xelas bûn.

Leyla Xanim li Mîtanî zivirî û weke ko henekên xwe bi wan bike, got:
— Hê tişt tune ye, lo! Mala te nekeve! Tu dibêjî qey xelkê tu carî zarok neanîne.
Binevş bêtir ket ber fediyê.
Mîtanî got:
— Tişt pê nayê. Hûn dîsa jî biçin. Hela ka bê textor çi dibêjê.
Leyla Xanimê ji neçarî got:
73
REŞ Û SPÎ

— Baş e. Em ê biçin. Lê, ez dibêjim; em ê belasebeb pereyên xwe bi bidin textoran.
Mîtanî fahm kir, bê nêyta diya wî çi ye.
— Na, na! Ne belasebeb e. Hela hûn biçin. Piştî ko hûn vegeriyan jî telefonî min bikin. Bila hayê min jê hebe.
Bi dû re, li aliyê odeka Resûl Beg niherî û got:
— Bavê min jî bi xwe re bibin. Bila ew jî hebekî ji xwe re bigere. Li hindur aciz dibe.
Leyla Xanimê bi mahdekî tirş li Binevşê niherî. Niherîna wê bala Mîtanî jî kişand. Wî jî mahdê xwe tirş kir û aciz bû. Binevşê bala xwe nedabûyê. Serê wê hê di ber wê de bû û li wan guhdarî dikir. Leyla Xanim ji bo ko bi ya wê nebûbû, li ber ket. Keserek kişand. Dîsa li wî zivirî.
— Baş e. Bila weke te be, lawo.
Mîtanî bi dû re destekî xwe ber bi wê de rakir û ji jina xwe re got:
— Binere! Tu dîsa wî kirasê xwe yê do li xwe nekî, ha! Tiştekî ko zikê te zêde xuya neke, li xwe bike.
Binevşê di ber xwe de got:
— Temam.

Ji ber ko mêrê wê li ber xwesa wê û gorma wê Mehabadê û zarokên din bi wê re xeyidîbû, li ber xwe ketibû. Piştî ko mêrê wê derket, ket odeka xwe û giriya. Nehat hêwanê û sifre jî ranekir, lê Leyla Xanimê vê carê guh nedabûyê. Ji ber ko Mîtanî li ber herkesî ew rezîl kiribû, dilê wê jî li Binevşê rehet bûbû. Piştî ko Leyla Xanimê Serdar û Meryem jî bi rê ve kirin, çû xwe li ser nivînên xwe dirêj kir û bîstikek tê re neçû jî ket xewê. Heta nîvroyê ranebû. Hew carekê gava ko Resûl Beg rabûbû, ji odekê deriketibû û bi dû re, dîsa vegeriyabû, bi dengê lingên wî bi xwe hisiyabû,.

16. Û jan jî kedî dibin...

Yekî rokekê li ser dîwarekî bi boyaxeke sor nivîsandibû:

»û jan jî kedî dibûn di nav çûyin û hatinên demsalan de
bi bayekî nas î kevin naxape êdî ev dil...«

Ro dihat nîvro. Li derve, baranê dest pê kiribû. Resûl Beg nimêja xwe qeza kiribû û hatibû ji xwe re li ber televîzyonê rûniştibû. Di televîzyonê de filîmekî li ser gundiyan hebû.

74

Bi dengê telefonê re veciniqî û rabû ser xwe. Çû ser serê Robîn û ew şi-yar kir. Gava ko Robîn çavên xwe vekirin jî weke ko dixwaze tiştekî bibê-je, li çepikan dixist û aliyê hêwanê nîşan dida. Wê gavê Robîn tiştek ji wî fahm nekir, lê gava ko dengê telefonê dîsa hat, rabû ser xwe û xar bir tele-
fonê. Ji aliyekî jî şîlaqa çavên xwe paqij dikir. Resûl Beg jî da pey wî û hat li ber wî sekinî.

— Elo, kerem bikin.

Dengekî zilaman bi kurdî û bi ken bersiv dayê:

— Merheba ji te re, Robîn.

Robîn deng nas nekir.
— Merhaba ser çavan. Tu kî yî?
— Te ez nas nekirim, ne weha?
Dengê hember weke ko henekên xwe bi wî bike dipeyivî. Ji lewra hebekî hêrs bû. Ji ber ko kêfa wî qet ji van henekan re nedihat. Resûl Beg carê niquşk li wî dixistin û weke ko bibêje »kî ye«, destê xwe radikir û li wî diniherî. Robîn qet bersiv nedidayê. Hew carekê weke ko bibêje »bes e, lo« destê xwe jê re kil kiribû. Dengê hember dîsa keniya.
— Xayin! Ma mirov hevalê xwe ji bîr dike?
Vê carê, êdî xulqê wî tam teng bûbû, lê ji bo ko ev xuya neke, dîsa weke berê pirsî:
— Ev tu kî yî?
— Ez im, ez! Elî.
— Elî?
Çi qasî fikirî jî kesekî bi navê Elî nehat bîra wî.
Dengê hember dîsa got:
— Heyla Xwedê li te bixe, lawo! Ez Eliyê Artîst im. Artîst!
Robîn bi vê gotinê, ew nas kir. Ruyê wî anî ber çavên xwe. Nizanîbû bê dê çi bigota. Hema ji ber xwe ve got:
— Wey, Artist! Tu ji kû derketî, lawo?
— Erê lawo, te em ji bîr kirine, ne weha?
Kenîya, nizanîbû bê çi dikir.
— Lawo, ma ez hê nû ji xew rabûme. (Bi dû re jî got.) Hela tu dev jê berdî. Tu ji kû digerî?
Elî keniya.
— Ez li Stenbolê me.
— Tu henekên xwe bi min dikî. Tu li kû yî, niha?
— Weleh, ez li Stenbolê me. Ez aniha jî li cem Mîtanî mim. Ger tu

bawer nakî, ez ê telefonê bidim wî.
Piştî ko dengê Mîtanî hatê, Robîn hê nû bawer kir.
Got:
— De binere. Tu bi tu deveran ve neçe, ha! Va ez aniha derdikevim. Hema heta saetekê ez li wira mim.
Bi lez xwe girê da û derket. Ji ber barana ko dibariya, rê hatibûn girtin. Ji lewre, heta ko mekîne gihîşt cihê ko Robîn dê lê daketaya, du saet derbas bûn.
Herçî Elî bû, gava ko Robîn ket kargeha Mîtanî, berê ew nas nekir. Lê belê, ji ber berçavka wî û kenê li ruyê wî ket gumanê. Li hevdu niherî. Robîn dikeniya. Elî rabû ser xwe û çû pêşiya wî. Hevdu himbêz kir.
— Tu bi xêr hatiyî. Tu çawa yî, lo?
Li hember hev, li ser kursiyan rûniştin. Ji cerga ko Robîn hatibû Stenbolê, hevdu nedîtibû. Hey bi ken li hevdu diniherî. Mîtanî rabû çay ji wan re xwast. Karkerekî wî çû pênc-şeş çay anîn û hat. Him henek menek bi hevdu dikirin, him jî Elî ji wan re behsa sedema hatina xwe ya Stenbolê dikir.
Herçî Elî bû, li Diyarbekirê bi alîkariya bavê xwe, ji xwe re dikanek vekiribû. Niha jî ji bo ko di dikanê de bifiroşe, hatibû ji febrîqeyeke tekstîlê alavan bikire. Çer ko daketibû, çûbû alav stendibûn û biribûn termînalê, bi dû re jî hatibû cem Mîtanî. Gava ko ji Robîn re got »ez zewicîme û du zarokên min jî hene«, Robîn ecêbmayî mabû. Hayê wî ji van tiştan çênebûbû.
Piştî ko bi hev re firavîn jî xwar, herduyan xatir ji Mîtanî xwast û derketin.

Dinya sar bû. Berf û baran tev li hev dibariyan. Herduyan ber xwe girt û ketin milê hev. Li ber derî sekinîn.
Robîn li dora xwe niherî û got:
— Em biçin kû, lo?
— Weleh, hema tu me bibî kî derê, em ê biçin wira.
— De hey em nikarin di vê hewayê de, tu tahmê ji xwe bikin. Hema ka em biçin malê çêtir e.
Xwe bera aliyê behrê dan. Herçî Elî bû, qama wî hema hema bi qasî ya Robîn bû, bes hebekî ji wî girstir bû. Ruyekî wî yê weha hebû ko mirov digot qey Xwedê ji qazî weha afirandiye. Çavên wî di bin birûyên stûr de wenda dibûn. Bêvila wî piçûk û gulover bû. Wexta ko dimeşiya, milên wî bi herdu aliyan ve kil dibûn.
76

Hevaltiya wan ji salên lîseyê hebû. Wê gavê, ji bilî Şêxo ji xwe sê-çar hevalên Robîn tenê hebûn. Elî jî yek ji wan bû û gelek tişt bi hev re par kiribûn.
Piştî ko hebekî meşiyan, Elî ji wî re got:
— Mîtanî got ko te dev ji mektebê berdaye.
Robîn keserek kişand. Destê xwe bi gazind rakir û got:
— Erê, lo! Belasebeb bû.
— Te bi zorê qezenc kiribû, lawo.
— Na lo, dev jê berde. Hingî ji min re bûbû meraq, ez ketibûm îmtihanê. Ji xwe, Mîtanî nehişt, ez qeyda xwe jê bibim. Heqê wê radizîne banqeyê. Bi xêra wê, em narin leşkeriyê jî.
Elî tiştekî din nepirsî. Ji xwe, ji ber sermayê hew dikarîbû bipeyiviyana jî. Di bin baranê de şil bûbûn. Gava ko behsa rojên xwe yên berê dikir, Robîn pirsî:

— Îja, hevalên me yên din çi dikin, lo? Te qet behsa wan nekir. Qey hûn hevdu nabînin?
Elî piçekî fikirî û li bersivekê geriya, lê tiştek negot.
Bi dû re, wî jê pirsî:
— Tu li kê dipirsî?
— Mesela, Selman hebû, Şêxo hebû û…
Li navê yekî din jî fikirî. Nehat bîra wî.
— Navê wî çi bû, lo! Te dît ew ê ko li dora qîza polîsekî digeriya, lo.
Tu deng ji Elî derneket. Bi dû re, got:
— Ha… tu behsa Hemdîn dikî.
Elî weke ko nedixwast behsa wî bike, navê wî gotibû. Vêya bala Robîn jî kişandibû.
— Erê erê. Hemdîn. Ma çi bû ji wî?
Elî kesereke kûr kişand. Deng ji wî derneket. Piştî ko hebekî meşiyan, di ber xwe de got:
— Hemdîn sala par hat kuştin, Robîn.
Kenê li ruyê Robîn ji nişka ve cihê xwe ji ecêbmayinê re hiştibû. Mat mabû. Sekinîn. Robîn ziq li wî diniherî. Nepeyivî. Elî dîsa ket milê wî û meşiyan.
Ji wî re got:
— Apê wî li wî dabû. Tê bîra te, ne weha? Apê wî Fermano sîxur bû. Dihat gotin ko çend caran pev çûne. Hemdîn carekê ew birîndar jî kiribû, lê nemir, bênamûs! Carekê deng hew ji Hemdîn derket. Piştî wê
77
REŞ Û SPÎ

bi rojan jî meytê wî li ser riya Bismilê hat dîtin.
Hew peyivîn. Li otobusê siwar bûn û çûn malê.

Gava ko daketin, Elî got:
— Te dizanîbû ko Selman derketiye çiyê, ne weha?
— Na, lo!
— Weleh! Ew jî hema hema sala te neqediyabû, derket.
— Hayê min jê çênebûye.
Piştî ko hebekî ponijî, got:
— Tu xeber ji wî hene gelo? Hê sax e?
— Na. Tu xeber jê derneket. Pismamên wî hene, ez carinan ji wan dipirsim. Hayê wan jî ji wî tune ye. Ez dibêjim qey hê sax e.
Robîn rojên berê anîn bîra xwe. Ew û Hemdîn û Şêxo tu carî ji hev nediqetiyan. Wê roja ko kuştina Seydo bihîstibûn jî herduyan bi wî re baz dabû û heta ji wira bar kirin û hatin Stenbolê jî ji wî neqetiyabûn. Bi hev re diçûn û bi hev re dihatin.
Di ber xwe de kir niçe niç. Çendekî bê deng meşiyan. Bi dû re, ji bo ko nepirse, di ber xwe de da, lê dîsa jî bi xwe nikaribû, got:
— Le Şêxo?
Elî jî li hember vê pirsê, bîstikekê bêdeng ma.
— Hayê te ji wî jî tune ye, ne weha?
Robîn beyî ko serê xwe rake, got:
— Naaa.
Elî keserek kişand, mijangên xwe rakirin li cihekî gelekî dûr niherî û sekinî.
— Şêxo di hefsê de ye.
Tu deng ji Robîn derneket. Ji vê rewşê diyar dibû ko êdî hertişt baş fahm kiribû û hewce nedîtibû ko li tiştekî din bipirse. Elî piştî ko di vê rewşa wî de têgihişt, bêtir hêrs bû û lêva xwe gez kir. Serê xwe rakir û li jorê niherî. Serê xwe bi kerb hejand.
Dinya dicemidî. Berfê hêdî hêdî erd digirt. Ser mekîneyên ko li qiraxa

riyê hatibûn rêzkirin, bi berfê ve dihat nixumandin.
Elî dîsa çavên xwe dagerandin ser riyê û serê xwe bera ber xwe da.
— Dihat gotin ko gerîlayekî li ser wî îfade daye. Qey wî şevekê ew li mala xwe hewandibû. Gava ko tê girtin navê hemû kesên ko alî wî kiribû, dide. Şêxo jî li xwe mikur nehat. Dihat gotin ko kûçikan ew pir êşandiye. Heyşt sal ceza jê re tê xwastin. Lê mehkemeya wî hê jî xelas nebûye.
Bi dû re jî got:
78

— Ez carinan diçim cem wî. Bes zor e. Êdî nahêlin em hevdu bibînin.
Ez jî nameyan ji wî re dişînim. Gava bihîst ko ez ê werim Stenbolê, ji te re silav şandin. Digot, ez dixwazim wî jî bibînim.
Robîn pir li ber ketibû. Serê xwe her bi kerb kil dikir û li ber xwe dini-herî. Elî jî ferq kiribû, bê çi tesîr lê bûye. Ji ber vê yekê, wî jî hew behsa wî kir.
Ji ser riyê dageriyan dikanekê. Elî hinek şêranî kirî û derket. Heta ko gi-hiştin malê, berf jî sekinîbû. Di şûna wê de, bayekî kur dest pê kiribû. Rojê ji bo çûyinê, haziriya xwe ya dawiyê dikir. Hêdî hêdî dibû êvar.
Wê şevê heta dereng şiyar man. Behsa rojên ko bi hev re derbas kiribûn kir. Behsa hevalên xwe yên berê ko niha bûbûn noka li kevir û wekî din jî behsa evînên berê kir. Robîn ji wî re behsa Gulcanê jî kir. Hew behsa Nûşînê nekir. Ew jî Elî çend caran xwast ko peyvê bîne ser wê, lê gava dît ko Robîn behsa keçikeke nû dike, dev ji wê peyvê berda.
Nîvrokî, Elî xatir ji malê xwast û herdu bi hevdu re derketin, çûn ter-mînalê. Gava ko gihîştin termînalê, ji çûyina mekîneyê re, hê saetek hebû. Ji ber ko dinya sar bû, ew jî çûn li kafeteryaya li kêleka termînalê rûniştin. Herkê çayek vexwar. Berî ko rabin, Elî hebekî jî bi tirs, weke tiştekî ko wî ji bîr kiribe bîne bîra wî, got:

— Te qet li Nûşînê nepirsî.
Ji cerga ko hatibû, dixwast li vê yekê bipirse, lê ji ber ko peyv nehatibû ser, cesaret nekiribû ko vê mijarê veke. Herçî Robîn bû, ji cerga ko Elî dîtibû, him digot hema bila neyê bîra wî û wê behsê veneke, him jî dixwast ji wî re rûne û behsa wê bike. Ditirsiya. Ji lewre, gava ko navê wê hat gotin, berê xwe da aliyê camê. Tiştek negot. Aciz bû. Ji hêrsa xwe, diranên xwe jidandibûn û li derve diniherî. Bi dû re lêva xwe xwar kir, keserek kişand û got:
— Dev jê berde, lo… Tiştê çû, nede dû.
Elî bişirî û got:
— Weleh ez nikarim, Robîn. Keçikê silav jî ji te re şand.
Robîn, him kêfa wî bi vêya hat, him jî hêrsa wî û liberketina wî mezintir bû. Ji kerban, keniya. Elî bala xwe dida tevgerên wî û dixwast têbigihêje bê ka çi difikirî.
Robîn çixareyek pêxist. Bêyî hişê xwe hilmeke kûr lê xist. Di nav dûmanê de ma. Mîna ko ruyê Nûşîn anîbe ber çavên xwe, hebekî bêdeng ma û li ber xwe niherî. Bi dû re, bi dengekî lerzokî got:
— Xêr e? Bi çi ruyî silavan dişîne?
79
REŞ Û SPÎ

— Ez jî nizanim. Carinan em hevdu dibînin. Lê çavên min bar nabin ko ez bi wê re bipeyivim. Rojekê hat dikana min. Qey ji hinan bihîstibû ko nûmaraya telefona te li ba min heye. Ji min xwast. Min got, »ez nikarim bidim.« Wê jî behsa te kir. Serê xwe bera ber xwe da û giriya. Gava ko Mîtanî hatibû Diyarbekirê, wê ew li sûkê dîtibû. Li gora ko ji min re got, ji wê rojê û vir de ye ko her roj xewna te dibîne. Gava ko serê xwe rakir, min li çavên wê niherî, Robîn. Derew nedikir. Bi rastî jî ji te

hez dike.
Robîn bêtir hêrs bû. Ev yek berî niha bi çar pênc salan ji wî re bihataya gotin, wî ê belkî reaksiyoneke cidatir nîşan bidaya. Wê gavê, peyveke mî-na vêya dikarîbû bikira ko Robîn bi şûn de vegere welêt jî. Lê îro?.. Îro ji bo van tiştan, dereng e êdî.
— Te jî bawer kir, ne weha? Ma qey ez nizanim, Elî? Min dizanîbû ko tu ê dawiya dawiyê behsa wê jî bikî. Û va ye te asoxî bi a xwe kir.
Serê xwe bi kerb hejand, destê xwe kir hutik û li maseyê xist. Çend saniyeyan bêdeng sekinî û li ber xwe niherî. Diranên xwe hişk jidandin. Kesereke kûr kişand. Bi destê xwe yê rastê eniya xwe hebekî mist da. Bi dû re, dîsa peyva xwe domand:
— Piştî ewqas salan, Elî. Piştî ewqas salan, ew ê silavan ji min re bişîne, ha!. Wexta ko li kuçeyên Diyarbekirê xwe dikişand, em nedihatin bîra wê, ne weha!
Robîn bi hêrs dipeyivî. Mirov dizanîbû ko dilê wî ji kerban tije bûye. Mirov digot qey ew ê aniha serê xwe deyne û bigirî. Dengê wî dilerizî.
— Yê te… tu silavên min li wê neke, Elî. Min têra xwe kişandiye. Min ji ber wê, tu xêr ji vî umrê xwe nedîtiye. Ji cerga ko ez ji wê veqetiyame, her ko ew tê bîra min, eynî weke ko xencereke zingarî li ser dilê min bikeve, Elî! Tu jî hatiyî û ji min re behsa giriyê wê dikî. Ma qey ew dikare bi qasî min bigirî? Ez ji kerba wê, hertim dev li canê xwe dikim, Elî! Tiştê ko vê qahpikê aniye serê min, dijmin jî nayne serê dijminan. Ma ez ê çawa baweriya xwe bi giriyê wê bînim? Ma qey tu vê rewşa min nabînî?
Û dîsa berê xwe da aliyê camê. Çavên wî zor didan sînorên xwe. Elî serê xwe bera ber xwe dabû. Ew jî poşman bûbû ko behsa Nûşînê kiribû.
Divê ji berê de reaksiyona Robîn bihesibandaya. Ji ber ko Robîn hêrs bûbû û bi dengekî bilind bi wî re xeyidîbû jî bêtir li ber xwe ketibû.
Çend kesên li dora wan jî bala xwe dabû wan. Robîn piştî ko hebekî hat

ser xwe, çixareyeke din jî pêxist. Tiliyên wî dilerizîn. Bîstikeke bê deng man. Di navberê de, carekê zivirî û li çavên Elî niherî. Bi dû re, dîsa veg-
80

eriya ser camê û beyî ko bala xwe bide tiştekî, li kesên di nav wê berfa ko hûrik hûrik dibariya de diçûn û dihatin niherî.
Bêhna wî hebekî hatibû ber. Dîsa li Elî zivirî û got:
— Xwezî te ez fahm bikirama, Elî. Wê gavê… min ê ji te re tişt miştên din jî bigotana.
Çendekî sekinî. Fikirî û li Elî niherî.
— Ez ji te tiştekî bi tenê dixwazim, Eli. Gava tu daketî, ji bîr neke, berê berê biçe cem Şêxo. Divê tu tu carî nehêle ko ew bibêje »hevalên berê ez ji bîr kirime.« Û jê re bibêje, Elî. Min hê ew rojên ko em li cem hev bûn, ji bîr nekirine û ez bêriya wî dikim.
Hew peyivîn. Herçî Elî bû, tu gotin ji devê wî derneket. Heta ko xatir ji hev xwast û li mekîneyê siwar bû jî li ser tiştekî din nepeyivîn. Otobusê li ser berfa erdê qirçe qirç ji tekerên xwe derxist û hêdî hêdî bi paş ve kişiya
û ji peronê derket. Serê Elî hê jî di ber wî de bû.
17. Ez ji te hez dikim, Gulcan…
Tarî diket erdê. Dinya sar bû. Berf bi hemû hêza xwe dibariya. Digel ko dibû êvar jî erd di bin berfê de, mîna zeviyên pembo xuya dibû. Ji ber şewqa berfa erdê, mirov nikarîbû lê biniheriya. Darên ko tazî mabûn, xwe bi berfê nixumandibû. Bayê kur, meş zehmet dikir, ji sermayê, ruyê mirov pûç dikir. Ezman xuya nedibû. Zivistanê cihê xwe xweş dikir. Robîn ji bo ko neqefile, xwe xûz kiribû, destên xwe xistibûn bêrîkên qapûtê xwe û dimeşiya. Xwe baş girê dabû. Qapûtekî kesk ko heta paş situyê wî digirt û ew ji hercar girstir rê dida, li xwe kiribû. Herçî berf bû,

xwe li ser porê wî û rîha wî ya ko ev deh roj bûn ko nehatibû kurkirin danîbû û ew mîna kalekî dida xuyakirin.
Li der û dora wî, hin zilaman ji xwe re maseyên piçûk danîbûn û kincên zivistanê yên ko ser wan bi naylonan hatibû nixumandin, difiroştin.
Çend xortên ko dest û milên xwe tije tiştên firotinê kiribûn, bi wan kesên din re bang dikir:
— Saet, bazin, pênûs, zincîr…
Dengên kesên ko dixwast tiştan bifiroşin, tev li hev dibûn. Di ber wan re, kesên ko xwe xûz kiribû û bi lez dixwast bigihêjin derinan, diçûn û dihatin.
Serê Robîn di ber de, di nav wan kesan û dengan re derbas bû. Ruyê wî, ji ber bê sor bûbû. Li rawestgehê, di nav gelek kesên din de, xwe da ben-

da otobusê.
Hin kesan pif destên xwe dikir, hin kesên din jî ji bo ko xwe germ bikin, di cihên xwe de direqisîn. Çavên herkesî bi bêsebirî li riyê bû. Mekîne diçûn û dihatin. Her ko mekîneyek dihat, giş bi hevdu re ber bi wê de direviyan û nivîsa ser wê dixwend.
Herçî Robîn bû, hingî di hindur de aciz bûbû, rabûbû û bi tena serê xwe derketibû derve. Di bin wê berfê de, bêserî meşiyabû. Çûbû li peravê, li kafeteryayekê rûniştibû û li deryaya ko dîsa har bûbû temaşe kiribû. Çavên xwe bera ser keleka ko li ser pêlan bi tena serê xwe kil dibû, dabûn. Heta êvarî, li wê kelekê temaşe kiribû û aciz bûbû.
Meşiyabû. Beyî ko ber bi deverekê ve biçe û beyî ko li wext û sermayê bifikire... Gava ko westiyabû jî telefonî Gulcanê kiribû û gotibû »ez aciz bûme, ka were, em hevdu bibînin.« Gulcanê jî gotibû »ka tu were cem

min, derve sar e. Ez li malê, li benda te me.«
Hindurê mekîneyê bûbû ko mirov nikarîbû gava xwe biavêje. Berî ko otobus tije bibe, ji xwe re cihek zeft kir. Him serê wî ji ber êşê dikira bite-qiya, him jî hingî di wê sermayê de meşiyabû, westiyabû. Çavên wî diçûn ser hev. Carê serê wî diket ber wî û dîsa şiyar dibû. Zêde hewil neda xwe ko şiyar bimîne.
Bexçeyekî mezin hat pêşiya wî. Her celeb kulîlk, giha, dar; dengê çivîkan û bêhneke xweş… Çemekî zirav di nav bexçe re diherikî û dengê xwe tev li yên doraliyê dikir. Ava çem dibiriqand û kefê lê digirt.
Zilamekî porreş di nav wê xweşiyê de, li ber wî çemî, pişta xwe dabû aliyê Robîn û rûniştibû. Darikek di destê wî de bû û bi wî darikî tiştek li erdê xêz dikir.
Robîn digel ko dûr bû jî dikarîbû tê derxistaya bê zilam çi dinivîsand.
Bi dû re, ew ê jî li vêya ecêbmayî bimaya. Zilêm piştî ko nivîs qedand û keserek kişand, darikê destê xwe li erdê bi hêrs cit kir û bîstikekê sekinî. Diranên xwe jidandin û li nivîsa xwe temaşe kir.
ba...
Gava Robîn gihîşt cem wî, zilam di ser situyê xwe re zivirî û li wî niherî. Zilam dişibiya Seydo, an jî Robîn digot qey weha ye. Çavên wî şil bûbûn û hêsir ji wan diniqutîn xwarê. Lêva xwe gez kiribû. Gava ko li Robîn ni-herî, axînek jê derket û dû re berê xwe guhert û serê xwe bera ber xwe da.
Ji nişka ve, dengê silehekê teqiya li doraliyê. Wê gavê ew hemû xweşî,
82

di bin reşahiyekê de ma. Deng ji çivîkan biliya. Bêhna xweş ya bîstika din wenda bû. Her tişt mat ma.
Dengê teqîna silehê, careke din hat. Qêrînek bi dil û mejiyê Robîn ve

ket. Mirov digot qey qirika wî dike biçire. Dengê teqîneke din jî hat û bi dû re hertişt bû mîna berê. Lê Seydo wenda bûbû û ew çemê bîstika din bûbû çemê xwînê. Robîn di cihê xwe de mat mabû. Çavên wî fireh bûbûn û şibiyabûn du tasan. Digiriya.
Yên dora wî, gişan bi awayekî ecêbmayî li Robîn diniherî. Serê wî li ber camê bû. Hêsirên wî ji ser hinarikên wî diherikîn xwarê. Bes, hê jî di xew de bû.
Zilamekî kal hêdîka bi ser wî de daqûl bû û bangî wî kir:
— Xorto, xorto!
Gava Robîn çavên xwe vekirin û li dora xwe niherî jî zilêm got:
— Tu baş î?
Zilêm bi dengekî nerm ko mirov ji ber neêşe pirsîbû. Yên dora wan jî bêtir bala xwe dabû wan. Robîn digel ruyê xwe yê sorbûyî, bi dengê xwe yê lerzokî got:
— Ez baş im, spas.
Û serê xwe bera ber xwe da. Herçî kesên li dora wî bûn, dilê wan bi wî şewitî û mîna ko ew ketibin wê rewşê, hin kesan ji wan fedî kir. Heta ko Robîn daket jî bala wan li ser wî bû. Robîn jî heta ko daketibû, serê xwe ranekiribû û li dora xwe neniherîbû. Wî dizanîbû ko çavên kesên li dora wî tevde li ser wî ne û gişan bala xwe daye wî. Gava daket û wî bayê xurt xwe li wî xist û ew cemidand, Robîn hê nû hebekî hat ser xwe.
Gulcanê berî ko Robîn were, ji ber ko hew sebir dikir, di hindurê malê de vir de û wê de diçû û dihat. Bêserî digeriya. Carê diçû ber pencereyê, li derve diniherî. Ditirsiya ko Robîn fikra xwe biguhere û neyê cem wê. Argûn geş kiribû, hindur kiribû mîna tenûrê.
Çi qas çêbûbû, çend meh di ser re derbas bûbûn? Nizanîbû. Lê digot qey ji cerga ko xwe nas kiriye, bi wî re ye û êdî hingî fêrî wî bûye, nema dikarîbû beyî wî îdare bikiraya. Piştî ko ew nas kiribû, tevgerên wê jî hat-

ibûn guhertin. Çavên wê her li rêyê bûn, guhê wê her li telefonê bû. Tim li benda wî bû. Bihataya jî nehataya jî. Her li benda wî dima û bêriya wî dikir.
Carinan, hayê Robîn jê nebûya jî gava ko heta êvarî, li bende dima û Robîn nedihat, hema serê wê diket ber wê, stuyê wê xwar dibû û wê keçika ko xort giş li dorê digeriyan û ji bo ko xwe di rêya wê de feda bikin
83
REŞ Û SPÎ

hema li benda işaretekê bûn, wê keçika ko kesî nikarîbû red bikiraya, wê keçika esmer ko ne mimkun bû ko dilê zilaman nelerizandaya, bi derbekê re dibû yeka weha ko dilê mirov pê bişewite. Hema serê xwe datanî û digiriya... Digiriya.
Guhên wê li derî bûn. Gava ko dengê derî hat, baz da û derî vekir. Demekê li devê derî mîna ko lal bûbe, tiştek negot û li wî temaşe kir. Ji kêfa, dikira bigiriya. Hema li wira xwe avêt situyê wî û ew himbêz kir. Da girî.
Kêfa Robîn jî bi vê himbêzkirinê hatibû cih. Xwe di himbêza wê de, serbest berda. Pişta wê mist da û ew bi ser sînga xwe de eciqand. Memikên wê di sînga xwe de his dikir. Ew bir hindur û li ser çonga xwe da rûniştandin.
Gulcanê ji kêfa nema dizanîbû bê dê çi bikiraya. Her ew maçî dikir û digot:
— Min pir bêriya te kiriye, Robîn. Pir!
Devê xwe xist devê wî. Heta ko av di lêvên wan de neman û tevizîn, devên xwe ji hev dernexistin. Hevdu tazî kir û lempe vemirand. Gava ko canê wan giha hevdu û germahiya canê hevdu di dilê xwe his kir, heyecana dilê wan ew dilerizandin. Hevdu himbêz kir û heta ko ji ser hişê xwe

ve çûn, bi wî awayî man. Dilên xwe bi wê himbêzkirinê germ dikirin û serxweş dibûn.
Robîn carekê serê xwe ji ser sînga wê rakir û li çavên wê niherî. Hingî hindur jî germ bûbû, herduyan jî xwê dabû. Kokên porên wan şil bûbûn. Canê wan nermtir bûbûn. Gulcanê bi wî halê xwe, ji her awayî xweşiktir bûbû. Gava Robîn li wê temaşe dikir, ket ber fediyê, xwast ko pêsîrên xwe veşêre, lê Robîn nehişt. Hêdika bi destê wê girt û ew da sekinandin. Gulcanê ji fediyan bişirî. Bi dû re, destên xwe serbest berdan û danî ser pişta wî, ew ber bi xwe de kişand. Robîn serê xwe dîsa danî ser sînga wê, hilma xwe berda û ew himbêz kir, maçî kir.
Wê rojê heta derengê şevê, di himbêza hev de man û ji hevdu pê ve, li tu tiştekî din nefikirîn. Herçî Robîn bû, nehat bîra wî bê çiçax serê xwe danîbû ser sînga wê û ketibû xewê jî.
Bi dû re, wî ê ji xwe re bigotaya:
— Ji zû ve, ez ewqasî bi rehetî û ji ber xwe ve neketibûm xewê. Ecêb e, min wê şevê, tu kabûs jî nedîtin. Gava ko ez diketim himbêza Gulcanê, mirov digot qey min hemû kul û kederên xwe ji ser xwe avêtine, min xwe ji wan şuştiye. Ez mîna ko di bihuştê de bim, dilgeş dibûm, bêhna min
84

fireh dibû. Gulcanê ez rehet dikirim. Bi vî awayî, her ko diçû, ez bêtir bi wê ve dihatim girêdan û min Nûşînê jî ji bîr dikir.
Tu carî li tiştekî weha nefikirîbû, lê wê şevê, tirsiya ko wê keçikê wen-
da bike. Qey ji ber wê ye, xwast bi wê re bizewice, da ko tu carî ji wî veneqete û wê wenda neke. Lê belê, wî ev yek ji wê re negot. Vêya jî heye-
caneke mezintir dixist dilê wî. Wî nedixwast ko ev heyecan tu carî biqediyaya. Wê şevê, êdî têgihiştibû: Wî ji Gulcanê hez dikir.

— Ez ji te hez dikim, Gulcan.
Te dît, gava ko hezkiriyê keçikekê ji şerekî giran ko hezkiriyên gelek keçikan hew dikarin jê vegerin, vegere û ji ber vê yekê, ew keçik çawa kêfê
bike, Gulcanê jî eynî weha kêf kir. Xwe mîna perîkekê sivik his kir. Digot qey di xewnekê de ye û nedixwast şiyar bibe. Di serî de, bawer nekir. Sê-çar caran çavên xwe qirpandin û dîsa li çavên wî niherî. Ji kêfan, nizanîbû bê dê çi bikiraya. Hema, xwe avêt situyê wî, ew himbêz kir û giriya. Têra xwe giriya. Bi dû re, Robîn ew rakir, hesirên wê bi tiliyên xwe paqij kirin û ew maçî kir.
18. Zayin…
Nîvê şevê bû. Berf sekinîbû. Dengê bê hê qut nebûbû. Li derve, seqe-meke mezin hebû. Li hindurê malê, çûyin û hatinek, tevliheviyek... Herkesî xwe bi lez girê dida. Dest û lingên wan li hev geriyabûn. Carê weke ko tiştek ji bîr kiribe, diketin odekan û derdiketin. Resûl Beg ji bo ko zarok hebekî din jî bilezînin, li ber derî sekinîbû û destên xwe li hev dixistin, işaret dikir. Divê zû bi zû derketana. Ew ê biçûna nexweşxaneyê. Binevş evarî ji nişka ve, li erdê bêhiş ketibû. Giş tirsiyabûn. Herçî Binevşê bû, berî ko bikeve, tu tiştekî wê tune bû. Weke hercar, şîva xwe xwaribû û rabûbû li ser yanê rûniştibû, bala xwe dabû televîzyonê. Gava ji bo ko biçe çayê bide ser rabûbû ser xwe, ketibû erdê û kef bi ser devê wê
ketibû. Robîn û Mîtanî tavilê ew rakiribû nexweşxaneyê.
Kesek li malê nemabû. Giş hatibûn nexweşxaneyê. Nexweşxane pir mezin bû. Her deverên wê dibiriqand. Resûl Beg û Leyla Xanim li qorî-dora qatê zayinê, li ser kursiyan rûniştibûn. Zarokên din jî li kafeteryaya nexweşxaneyê li benda xebereke xêrê bûn. Gava ko Robîn bi hemşîreyan re dipeyivî, Mîtanî bêserî li qorîdorê diçû û dihat. Giş li benda bûn ko

Binevşê ji emeliyatê derkeve.
Piştî du saetan, deriyên asansora mezin vebûn. Giş bi hev re, ber bi wê
85
REŞ Û SPÎ

de reviyan. Binevş di nav çend hemşîreyan de, li ser sedyekê ji asansorê derdiket. Jana ko dikişand, ji ruyê wê xuya dibû. Lêva xwe gez kiribû. Porê wê bela wela bûbû, ruyê wê nepixîbû, di nav xwêdanê de mabû. Serûm di piyê wê de bû. Hê nehatibû ser hişê xwe.
Hemşireyan ew bir odeya ko ji bo wê hatibû amadekirin. Textora wê nehişt tu kes têkeve odeya wê. Mîtanî çi qasî li ser rewşa wê ji hemşîreyan pirsî jî tu bersiv wernegirt.
Hemşîreyekê ji wî re got:
— Divê hûn bi textora wê re bipeyivin. Yê me, em bi tiştekî nizanin.
Piştî çend deqîqeyan, pîrekek ko berdilkeke spî lê bû, ji serê qorîdorê xuya bû. Hat û piştî ko tişt miştin ji hemşîreyan re gotin, çû ket odeya Binevşê. Hemşîreya ko bîstika din bi Mîtanî re peyivîbû, hat cem wan û got:
— Textor Xanim dixwaze bi mêrê wê re bipeyive.
Mîtanî rabû da pey wê. Robîn jî bi wan re çû. Ketin odeya Binevşê. Textor li ber serê wê, li ser lingan sekinîbû, serûma wê rast dikir. Gava ko Mîtanî û Robîn silav da û ketin hindur, li wan zivirî. Got:
— Kîjan ji we mêrê wê ye?
Mîtanî got:
— Ez im.
Bala wî li ser Binevşê bû. Gava ko ew di wê rewşê de dît, dilê wî êşiya, zikê wî bi wê şewitî. Bes guhê wî li ser textor bû.
Textor, pîrekeke kinik û xweşik bû. Ruyê wê makyajkirî bû. Yê

nizanîbûya, bawer nedikir ko ev pîrek niha ji emeliyatê derketibû. Kubar û bi ken dipeyivî:
— Derbasbûyî be. Rewşa nexweşa me pir baş e. Emeliyateke pir dijwar derbas kir. Niha, ne li ser hişê xwe ye. Bîstikeke din, ew ê were ser hişê xwe. Ji bo ko cihê emeliyata wê neêşe, ew ê hemşîre were û hebekê bidê. Heke ew heta sibehê bi xwe nehise, baş e. Ji ber vê yekê, ez naxwazim îşev
tu kes têkeve odeya wê. Sibehê, ez ê dîsa werim û li wê biniherim.
Carekê li Binevşê zivirî. Dilê wê pê şewitî. Bi dû re, dîsa berê xwe da wan û got:
— Ma qey ev zaroka we ya yekem bû?
Mîtanî got:
— Belê.
Jinikê dîsa li Binevşê niherî. Ji dekan bişirî û got:
— Zor e. Lê belê, divê hûn niha li nexweşa xwe bifikirin. Bila heta
86

sibehê, di xew de be. Bi dû re, hûn dikarin dîsa wê bibînin.
Keserek kişand û li Mîtanî zivirî.
— Hela bila îşev derbas bibe, Xwedê mezin e.
Ruyê Mîtanî zer bûbû. Dikira bigiriya. Ji êvar de nesekinîbû. Ji xwe, ne yekî xurt bû. Ji mirina jina xwe jî pir ditirsiya. Herçî Robîn bû, weke ko ne xema wî be, bê deng sekinîbû û li jinikê guhdarî dikir.
Jinikê got:
— Ne pêwîst e ko hûn îşev li vira bimînin. Lê heke we pîrekek bi xwe re anîbe, hûn dikarin ji bo alîkariyê li cem wê bihêlin.
Bi dû re, jinikê berê xwe da derî.
— Hûn dixwazin, ka em derkevin. Hûn jî biçin mala xwe, ji xwe re

rakevin. Ez dizanim ko niha hûn ji wê bêtir westiyane. Qet meraqan nekin. Sibehê, piştî ko min dîsa li wê niherî, ez ê bi we re bipeyivim. Hûn ê bibînin, tiştekî wê namîne. Gelek nexweşên min ên weha çêbûne. Xwedê bibêje erê, du rojên din hûn ê nexweşa xwe bibin malê. Dîsa derbasbûyî be.
Jinik ji odeyê derket. Wan jî da pey wê. Li ber derî xatir ji wan xwast û çû, bi dizî ji hemşîreyê re got:
— Heke tiştek bibe, xeberê bidin min. Ji deh deqîqeyan carekê jî li tansiyona wê biniherin.
Textor çû. Hemşîre carekê ket odeyê û derket. Mîtanî û Robîn bîstikekê li ber derî çûn û hatin. Bi dû re, giş bi hev re daketin cem zarokên din. Mehabad û Serdar û Meryem li benda wan bûn.
Mîtanî piştî ko ji wan re jî behsa rewşê kir, got:
— Bila Mehabad biçe cem wê. Hûn jî biçin malê. Yê min, ez ê li vira rûnim. Belkî tiştek lazim bibe.
Mehabad rabû çû odeya Binevşê. Yên din çûn malê. Mîtanî jî çû ji xwe re qehweyek kirî û hat çixareyek pêxist.
Binevşê wê şevê, du caran bi xwe hisiya û bi qasî ko nexweşxaneyê rake ser lingan qêriya. Heta nexweşên din jî bi dengê wê derdiketin ber deriyên xwe û bi meraq li aliyê odeya wê diniherîn. Hemşîre giş, ber bi odeya wê ve direviyan. Her ko ew bi xwe dihisiya, hemşîreyê derziyeke din lê dixist û ew dixist xew.
Mîtanî heta sibehê, li ber deriyê wê nobedarî kir. Ji bo ko hemşîre bêtir guh bide Binevşê, hinek pere jî da wê. Heta sibehê, di dilê xwe de dia dikir, da ko jina wî nemire. Rewşa ko ew ketibûyê bala nexweşên din û hemşîreyan jî kişandibû. Dilê gişan bi wan dişewitî. Kesî bawer nedikir

ko li Binevşê bibe sibe.
Roja din, gava ko bûyerên şeva çûyî ji textora wê re hatin gotin, textorê jî weke ko tiştekî pir asayî be, gotibû:
— Qet tişt pê nayê. Ji xwe re nekin xem.
Bi dû re jî weke ko her textor ji bo nexweşên xwe dibêjin, bi awayekî bixwebawer, gotibû:
— Hûn ê bibînin, sibehê tu tiştekî wê namîne. Bi xêr û silamet, em ê du rojên din wê ji nexweşxaneyê derxînin.
Herçî Mîtanî bû, piştî tiştên ko ji devê textorê bihîstibûn, dilê wî hebekî rehet bûbû; lê dîsa jî di dilê xwe de gotibû:
— Ev jinik çi qasî xemsar e, lawo! Her ko jina min diqîriya, min digot qey ew ê bimire; îja ev textora han ji min re dibêje ko ji xwe re nekin xem. Xwedê kesî nexe ber destê van textorên bêbav, lawo! Ev nizanin, bê mirov
çi dikişîne. Gava ko me ji wê re behsa qêrînên Binevşê kir, tew li ber jî neket.
Binevşê ber êvarkî, hat ser hişê xwe. Ev serûma çaran bû ko dihat guhertin. Hayê wê ji tiştên ko hatibûn serê wê tune bû. Lê her derê wê diêşiya. Gava lê hay bû ko zaroka wê ji ber wê çûye, mîna ko xwîna wê zuha bûbe, bîstikekê bê deng sekinî. Çavên wê fireh bûn. Fedî kir ko li ruyê Mîtanî û Robîn binere. Bi dû re, ji bo ko ruyê wê neyê dîtin, mîna sûcdarekî hêdîka berê xwe ji wan guhert û giriya. Tansiyona wê rabû. Hemşîreyê dîsa derziyek lê xist. Di xew re çû.
Piştî sê rojên din, Binevş ji nexweşxaneyê derket. Pîrek ketin milê wê û ew bir odeka wê û li ser textê wê yê razanê vexist. Hefteyekê di nav nivînan de ma. Heta ko baş nehat ser xwe, Leyla Xanim û Mehabadê nehişt ko ew destê xwe bide karekî jî. Ew jî li vêya ecêbmayî mabû.

Wê tiştin din hêvî dikirin. Digot qey ji bo ko zaroka wê ji ber çûbû, ji niha û bi şûn de, li vê malê, tu kes dê xatir nede wê. Tew ditirsiya ko wê biavêjin ber derî. Belkî wan ê ew bişanda mala bavê wê jî. Lê belê weke ko
ew difikirî nebû. Mehabada ko berê guh nedida wê, bi carekê ve hatibû guhertin. Ji bo nexweşiya wê, ji karê xwe destûr jî stendibû. Leyla Xanim û Resûl Beg ji ber serê wê ranedibûn. Herçî Mîtanî bû, dilê wî bêtir bi wê ve bû û êdî êvaran zûtir dihat malê. Tiştên ko dihatin pê, giş bi dilê wê bûn.
Gava Binevşê dît ko nexweşiya wê bi kêrî gelek tiştan hatiye û zaroka ji ber wê çûye jî ne xema kesî ye, digel ko di hefteyekê de rehet bûbû, hefteyeke din jî di nav nivînan de ma. Her gava ko ji bo tiştekî rabûya ser
88

xwe jî dek dikir û carê bi dereke xwe digirt û dîsa xwe diavêt ser nivinên xwe. Dixwast ko bi vî awayî, mêrê xwe dîsa bi xwe ve girê bide.
Dek û dolabên Binevşê yên nû, bala Leyla Xanimê kişandibû. Ji ber ko Mehabadê jî dîsa dest bi karê xwe kiribû, ew bi tenê mabû û karên malê jî giş di situyê wê de mabûn. Carinan, di ber xwe de dipeyivî û gava hi-nan lê bipirsiya jî tavilê dest bi gilî û gazindên xwe dikir û dîsa tansiyona wê radibû.
Gava Meryemê û Serdar didît ko digel ko nexweşiya Binevşê derbas bûye jî ew ji nav nivînan dernakeve û diya wan bi tenê karên malê giş dimeşîne, pir bi wan tahde hatibû. Ji lewre, gava ko çav li Binevşê diketin, weke ko çav li dijminê xwe bikevin, hêrs dibûn. Lê belê, ji tirsa Mîtanî, kesî ji wan newêrîbû dengê xwe jî derxistaya.
89
REŞ Û SPÎ

90

Beş II, Ez ne ez im êdî...
1. Hespê har…
Ev ji nîv saetê zêdetir bû ko Robîn li wira sekinîbû. Carê li saeta xwe dini-herî, serê xwe bi aliyê rêyê de dirêj dikir û di cihê xwe de dikir ufe uf. Ji xwe re digot, »ez belasebeb li vira rawestiyame.«
Dinya sar bû. Li erdê, bi qasî bihustekê berf hebû. Bayekî weha sar di-hat ko gava li ruyê mirov diket, mirov digot qey gwîzên dibirî. Kesî nikarîbû germahî bianiya bîra xwe jî. Her dever bûbû qeşa. Mekîneyên ko derbas dibûn, ji bo ko neşemitin û li bin guhê hev nekevin, hêdî hêdî diçûn. Li ser hinekan ji wan, berfa ko ji êvarî de dibariya hebû.
Kesên ko li rawestgehê li benda otobusan bûn, ji bo ko xwe germ bikin, bi vir de û wê de diçûn û dihatin. Gişan ji serma piştên xwe xûz kiribûn, herdu milên xwe bilind kiribûn û situyên xwe mîna kîso kişandibûn hin-dur. Xortekî girs û dirêj, çefiyek li serê xwe gerandibû, destên xwe xistibûn bêrîka qapûtê xwe û ji bo ko xwe hebekî germ bikiraya di cihê xwe de direqisî. Ji çavên wî pê ve, tu deverên wî yên din xuya nedibûn. Pîrekek ko bevila wê bûbû mîna gêzerekî, ji sermayê dilerizî û diranên wê li hev diketin. Şeq şeqa diranên wê, yên dora wê ji guhan dikirin. Lê hingî canên wan gişan pûç bûbûn, tu kesî di xwe re nedidît ko li xwe bizivire û li dora xwe jî binihere.
Robîn aciz bûbû. Ruyê wî sor bûbû. Digot qey lêvên wî qeşa girtiye. Heke yekî ji wî tiştek bipirsiya, devê wî dê negeriya û wî dê nikarîbûya tu bersiv bidayê. Ji sermayê, serê tiliyên lingên wî tevizîbûn. Mîna ko pêxwas li ser wê erda hişk û sar sekinî be, lingên wî pûç bûbûn. Digot qey lingên wî dikin ji wî bikevin. Guhên wî qeşa girtibû. Hiseke weha pê re

çêbû ko heke wî dest guhên xwe bidaya, guhên wî jî dê ji wî biketana. Ji ber vê yekê, newêrîbû dest guhên xwe bidaya. Bevila wî ya sorbûyî carê diherikî û wî dikir fişe fiş. Lê hingî cemidî bû, her ko wî ji bo kişandina bêvila xwe destê xwe didayê, bi awayekî weha dişewitî ko tu nemabû, dilê

wî ji bîr biçûya. Sermayê, zor dida sebra wî jî û canê wî giran dikir. Dixwast hema xwe bigihîne deverekê û ji xwe re pal bide.
Teqsiyeke zer hat û li ber wî sekinî. Serê Robîn di ber wî de bû. Yekî serê xwe ji camê derixist, li derve niherî û bangî wî kir:
— Robîn!
Robîn li wî dengî zivirî. Lêwik destê xwe ji wî re kil kir. Ev Bişar bû. Robîn di ber xwe de bişirî, serê xwe ji wî re hejand û ber bi wî de meşiya.
— Tu li kû mayî, lawo? Ez li vira ji sermayê mirim, wey!
Bişêr peyva wî birî û bi kenekî şermokî got:
— Tu çi bibêjî, heqê te heye. De ka were, siwar bibe, em ê bi dû re bipeyivin.
Çer ko siwar bû, cihê xwe xweş kir. Germahiya ko xwe di hindurê mekîneyê belav kiribû, laşê wî hêdî hêdî germ kir. Piştî ko germahiya hindur, laşê wî bi temamî nerm kir, sistbûnek li laşê wî peyda bû û ji ber ko tirsa sermayê nemabû, wî jî ber xwe hêdî hêdî vekir. Bişêr çixareyek da
wî, yek jî ji xwe re pêxist. Bi dû re, li wî zivirî, ji bo ko xwe bide efûkirin, got:
— Li qusûra min nenihere. Welehîn, ne sûcê min e. Li Yenîkapiyê rê hatibû girtin. Em saetekê li wira awiqîn. Ancax me xwe gihand vê derê.

Dît ko Robîn bi hêrs li wî dinihere. Ji awirên wî fahm kir ko ew pir li benda xwe sekinandiye. Tişt negot. Hema bi destê wî girt û weke ko li ber wî bigere, bişirî.
Robîn li ser vê hereketa wî, piçekî nerm bûbû.
Bi gazindî got:
— Tu çi bela yî, lawo! Ez nizanim bê ez ê çi bikim bi te…
Bişar keniya. Bîstikekê bi çavên tijehezkirin li ruyê wî niherî. Bi dû re berê xwe guhert, destê xwe bir ber devê xwe û gulpek ji çixareya xwe kişand.
Bişêr tiştek ji şifêr re got û erebeyê xwe ji neqeba pêşiyê bera jêrê da. Di nav trafîka Stenbolê de, bi zorê diçûn. Xwe asoxî, ji nav trafîka tevlihev derxist û ketin nava taxekê. Piştî ko du-sê kuçeyên din jî li dû xwe hiştin, hatin li ber apartmaneke mezin sekinîn.
Robîn got:
— Ev tu me dibî kû, lo?
Bişêr dîsa bi ken bersiva wî da:
— Hela tu ka were, tu ê bibînî.
Ketin hindurê apartmanê. Apartmaneke bêdeng û tarî bû. Dengê derî
92

û yên lingên wan di hindurê vê avahiya tarî ko saw dixist dilê mirov de, olan dida. Piştî ko ketin asansorê û pê derketin jorê, Bişêr ji awirên Robîn yên bimeraq fahm kir ko divê zû bi zû tiştekî bibêje. Gava ko asansor li qatê çaran sekinî û derketin, berê xwe da deriyekî. Robîn jî dabû pey wî. Gava Bişêr mifta xwe dixist derî, di ber xwe de, got:
— Ji min pê ve, tu kes jî bi vî xaniyî nizane. Carinan, gava ko bêhna mirov teng dibe, xaniyekî weha jê re
pêwîst e.

Bi dû re jî got:
— Du sal berê, min bi hevalekî xwe re ev xanî kirê kiribû. Bi dû re ew vegeriya welêt. Min jî dev ji vî xaniyî berneda. Çi çax ez aciz bibim, ez hema têm û xwe diavêjim vira.
Heta ko wî peyva xwe xelas kir, ketibûn hindur jî. Robîn tiştek negot. Zêde guh nedabûyê. Bes weke ko bibêje »min fahm kir«, serê xwe hejand.
Berê, çavên xwe li hindur gerandin û bi dû re jî qapûtê xwe danî û çû xwe li ser paldankekê dirêj kir.
Hindurê xênî sar bû. Bêhna çixareyê ketibû hindur. Xwelîdankên tije li rastê bûn. Merşa ko li erdê hatibû raxistin jî gemarî bûbû. Ji rewşa wê diyar dibû ko ji zû de nehatibû şuştin. Doşekeke ko ser wê bi newresîmekê hatibû nixumandin li erdê bû. Li kêleka doşekê jî betaniyek xuya dibû. Li kêleka paldanka ko Robîn xwe li ser dirêj kiribû jî li ser kursiyekê teybek û li ber wê jî çend kaset hatibûn danîn. Xuya dibû ko Bişar zêde li vira dima.
Robîn, berê, serê xwe zivirand û li kasetan niherî. Bi dû re, rabû ser xwe û çû rahişt wan. Yek dudu xistin teybê û ceribandin. Kêfa wî ji wan re nehat. Mahdê xwe hebekî tirş kir, bi dû re rahişt yeka ko tu nav li ser tune bû û xist teybê. Guhê xwe da melodiyê. Bi naskirina melodiyê re kêfa wî hat. Pê re, xemgîniyek jî peyda bû di dilê wî de. Ji ber ko her melodiyeke nas a kevn, bi xwe re ji demên bihurî hin dîmen jî dianîn û keserek bera dilê mirovî dida.
... hey lo bira
Heseno bira
Şûrê destê te sincirî...
Bîstikekê li ber rûnişt û lê guhdarî kir. Bi dû re, ji wira rabû, hat şûna xwe û dîsa pal da, guhê xwe da teybê.

93

REŞ Û SPÎ

Bişêr sobeyeke ceryanê anî û fîşa wê xist pirîzê. Xwelîdankên li erdê birin û vala kirin. Çû perde ji ber pencereyê da alî û bîstikekê bi awayekî bêdeng li derve niherî. Ji bo ko bêhna hindur derkeve, pencereyek vekir. Bayê cemidî hat hindur. Wî ew bayê cemidî kişand hindurê xwe. Li berfa sipîboz, darên riq û rût, rêya vit î vala niherî. Guhê xwe da dengê bê. Keserek kişand. Bi dû re, pencere girt, perdeya wê da ber û hat li hember Robîn, li erdê, xwe da ser balgifekê û rûnişt.

Robîn pal dabû, çavên xwe girtibûn û li teybê guhdarî dikir. Kilaman dikir ko herdu jî dengê xwe dernexin û guhdarî bikin. Kilamên ko ew bi xwe ve girê didan…

Piştî bîstikekê, Bişêr, beyî ko serê xwe rake û li wî binihere, got:

— Ez pir aciz dibim, Robîn. Ez nizanim bê ez ê çi bikim.

Çixareyek pêxist. Robîn tiştek negot. Wêneyekî çarçovekirî li dîwêr hatibû daliqandin. Robîn çavên xwe di wî wêneyî de cit kirin. Wêne reş û spî bû, mirov digot qey bi destan hatibû çêkirin. Tê de, şervanekî şût î tazî xuya dibû. Li ser hespê xwe bû û tivingek li milê wî bû. Herdu destên xwe hişk şidandibûn, ber bi jorê ve vekiribûn û li ezmanê tarî diniherî û dia dikir.

Di binî de jî helbestek hatibû nivîsandin:

di şerekî dijwar de, ez bi tena serê xwe mame
hevalên min giş hatine kuştin, ya rebbî
tu min li ber bîraninên wan fedîkar dernexe
û ji vî şerî bi saxî venegerîne…

Bişêr bala xwe nedabû wî. Rûniştibû û li çixareya xwe ya ko dûmana wê bi ser serê wî ketibû û ber bi jorê ve hildikişiya, diniherî. Destê xwe, beyî

ko bizanibe, bê çi dike, di xwelîdankê de dida. Hê jî di ber xwe de dipeyivî:
— Ez ji vî bajarî hez nakim, Robîn. Ne ji ber tu sedeman. Ez ji tu bajaran hez nakim. Her der mîna hev in. Îmana min ji vê dinyayê diçe.
Êşek ketibû serê wî. Bîstikekê sekinî, serê xwe bera ber xwe da. Bi dû re serê xwe rakir, li aliyê Robînê ko li çixareya destê xwe temaşe dikir, niherî. Bi dû re got:
— Ez carinan li kuştina xwe jî difikirim, weleh. Belê, ez ji dil dibêjim; ez bi awayekî cidî li xwekuştinê difikirim. Lê ez cesaret nakim.
Peyvên wî yên dawiyê, bi zorê ji devê wî derketibûn. Dengê wî piçekî
94

hatibû guhertin, lerizîbû. Weke ko bi xwe re bipeyive, peyivîbû. Lê, ji ber ko behsa derdê xwe kiribû jî kulên dilê wî ji nû ve tev rabûbûn. Kela girî ketibû qirika wî.
Ji bo ko negirî, dev ji peyva xwe berda. Weke ko diayek kiribe, bi destekî xwe ruyê xwe mist da, keserek kişand, berê xwe da aliyê dîwêr û ma.
Robîn piçekî din dirêjkirî ma. Bi dû re, rabû ser xwe. Bêhna wî teng bûbû. Keserek kişand. Li Bişêr nediniherî. Weke ko ji berê de bi van tiştan dizane, aciz bûbû. Hew dikarîbû xwe ragirtaya.
Bi gazind, got:
— De here, lo! Tu dibêjî qey tu bi tenê weha yî, ne weha? Bi hezaran kesên mîna te hene. Ma kî ji vê dinyaya kambax razî ye? Mirov li mala xwe rûne, nikare çareyekê ji xwe re bibîne. Ma tu dibêjî qey hema tu li xwe weha bikî û ji însanan birevî, tu ê bikaribî dilê xwe rehet bikî? Ma qey tu ê bi dû re, dîsa nekevî eynî rewşê?
Robîn bi vê rewşê pir baş dizanîbû. Di dilê xwe de, wî jî baweriya xwe

bi gotinên weha nedianî. Carinan, gava ko ew jî weha bêhnteng dibû û neçar dima, serê xwe li dîwaran dixist. Lê belê, ev tecrube, tu carî bi kêrî çareserkirina rewşa ko niha Bişar tê de bû, nedihat. Ji bo kesê ko di rewşeke weha de ye çi qasî zor be, ji bo yê ko dixwaze çareyekê ji vî derdî re bibîne jî ewqasî zor e. Belkî jê zortir e jî. Ji lewre, hew dizanîbû bê mirovî di rewşeke weha de, dikarîbû çi bigotaya.
Hêrs bûbû. Çavên wî yên reş fireh bûbûn. Li benda bersiva Bişêr sekinî. Bişar nepeyivî. Berê wî hê li dîwêr bû. Robîn çû li ber wêneyê li dîwêr sekinî. Bi destê xwe wêne nîşan dayê, li wî zivirî û weke ko bi wî re bixeyide, got:
— Te ev wêne ji bo çi li dîwêr xistiye? Ma ne ji bo ko te hê jî hêviya xwe ji tiştinan qut nekiriye? Bibêje, kerb! Bibêje, kîn! Bibêje, şer! Lê nebêje, xwekuştin.
Bişar li ber xwe ket. Serê xwe xist ber xwe û sekinî. Êşa serê wî mezintir bû û xwe di damarên wî re, li canê wî gişî belav kir. Dîsa weke ko bi xwe re bipeyive, bi dengekî gelekî nizm, di ber xwe de got:
— Kerb… Kîn… Mirin…
Diranên xwe jidandin û bêhna xwe ji bêvilê berda. Serê xwe kil kir û dîsa di ber xwe de got:
— Ez ji vana pê ve, baweriyê bi tiştekî din naynim. Şer ne karê herkesî ye. Ez bawer nakim ko şer bikaribe bibe çare. Tew gava ko ez xwe di na-

va şeran de difikirim, dilê min bêtir dişewite. Ez ê çawa bikaribim şer bikim?
Serê xwe rakir. Çavên wî yên kortçûyî, qels bûbûn. Di ruyê wî de, qet dewsa tu kenî ne xuya bû. Mirov digot qey ev dev tu carî nekeniyabû.

Qermîçokên dora çavên wî bêtir kûr bûbûn.
Ziq li çavên Robîn niherî. Bi awirin weha tûj diniherî ko Robîn ji wî tirsiya. Destên xwe li çongên xwe xistin û qêriya:
— De ka tu bibêje îja, ha! Ma ez ê çawa bikaribim şer bikim, ji bo Xwedê?
Ew jî hêrs bûbû. Çavên wî yên piçûk, sor bûbûn. Bûbû mîna çiyayekî weha ko li ber teqandinê bû. Dîsa berê xwe guhert, pişta xwe da dîwêr, serê xwe ber bi jorê ve bilind kir. Keserek kişand û bîstikekê bi wî awayî sekinî. Bi dû re, beyî ko berê xwe bide aliyê Robînê ko li ser lingan li wî guhdarî dikir, got:
— Tu dizanî, bê dilê min çawa dişewite? Ez hatime vira, min xwe xistiye quncikekê û ez di vê quncikê de, asê bûme. Ez nizanim, ez ê bi kû de herim. Ez ji vê jiyanê, tahmê hew distînim. Rêkên min giş xetîmîne, Robîn. Ez asê bûme. Tew carinan, ez ji xwe re dibêjim ko »ez belasebeb dijîm.«
Dengê xwe birî û sekinî. Serê xwe bi kerb hejand û dîsa xwe bera ber xwe da û ma. Robîn hew dikarîbû tiştek bigotaya. Ev peyvên Bişêr ên dawiyê, tesîreke weha li wî kir ko ew jî li xwe bifikire. Di ber xwe de got:
— Kerb!..
Û serê xwe bi kerb kil kir, keserek kişand û ma.
Derdê wî û yê Bişêr yek bûn. Lewma, êşek ket serê wî jî. Hêdîka çû û li şûna xwe ya berê, li ser paldankê rûnişt. Pişta xwe sipartê, serê xwe ber bi
jorê ve rakir û li ser qiraxa wê ya jorê danî. Çi çax li wî weha bibûya, canê wî sist dibû û hema dixwast ko rakeve. Ji xwe, ji ber ko gelekî li ber wê ser-
mayê mabû, canê wî jî westiyabû. Çer ko serê xwe danî, çavên wî pê re çûn ser hev.

Demeke dirêj, deng ji herduyan jî derneket. Bi dû re, Bişêr serî di ber de got:
— Ez gelekî fikirîm, Robîn.
Û piştî ko keserek kişand, got:
— Ez ê herim Diyarbekirê.
Robîn tu bersiv nedayê. Ji zû de, di xewê re çûbû. Dengê wî nebihîstibû. Gava Bişar lê hay bû ko hevalê wî di xewê de ye, xwe bêtir bi tenê
96

his kir. Serê xwe danî ser çonga xwe û ma. Demeke dirêj, ji cihê xwe ranebû.
Ew bêdengiya bîstika din, dîsa li dora wan çêbûbû. Tîna sobeya cereyanê, bi kêrî germkirina hindur nedihat. Li derve, fîzîna bayê kur her ko diçû xurttir dibû. Di ber deriyê balqonê û qiraxên pencereyan re, bayê cemidî dihat. Hindurê xênî sartir dibû. Tevî tesîra êşa serê xwe û sarbûna hindur jî li hember giranbûn û sistbûna laşê xwe têk çû û ew jî cihê xwe de ket xewê.
Robîn carekê bi xwe hisiya û li dora xwe niherî. Situyê wî qerimîbû. Bi zorê rabû ser xwe. Lempeya hêwanê vêxistî bû. Bişar ne li hindur bû. Got qey li hêwanê, li ser nivinên xwe razaye. Wî jî xwe li ser doşeka erdê dirêj kir û dîsa çavên xwe girtin.
Gava ko şiyar bû, dinya rohnî bûbû. Ji xewê westiyabû. Çavên xwe vekirin û li dora xwe gerandin. Bêdengiya ko ji êvarê de xwe li hindur belav kiribû, hê dom dikir. Hindur nîvtarî bû.
Bişar ne li hindur bû. Li ser yanêya hember, betaniyeke pêçayî û balgîfek bi ber çavên wî ve diketin. Betaniyek jî bi ser wî de hatibû werkirin. Lê fikirî. Hat bîra wî ko êvarî ser xwe nenixumandibû û di xewê re çûbû. Lê bi dû re, têgihişt ko divê Bişêr ew nixumandibe. Lê, ka Bişar? Bi heye-

canekê ji nav betaniyê pengizî.
Rabû ser xwe û çû li hindur, li Bişêr geriya. Li hêwanê niherî...
Bişar ne li malê bû. Vegeriya û li ser betaniya xwe rûnişt. Li saeta li dîwêr niherî. Bi dû re, di pencereyê re li derve niherî. Berf dibariya û tu der xuya nedibû. Bi dû re, dîsa berê xwe ji nişka ve da aliyê saetê. Li biniya saetê kaxizek hatibû daliqandin. Cara din, gava ko li wî aliyî niherîbû, lê hay nebûbû. Bi heyecan û lezekê rabû ser xwe û çû ew kaxiz ji dîwêr rakir. Gurpe gurpa dilê wî bû.
Robîn,
Ez diherim. Hespekî har di bin min de ye. Ez nikarim wî rawestînim.
Dilê xwe negire. Ez ji xatirxwastinan hez nakim. Ji ber wê, min ev rê hilbijart.
Mîna ko cereyanê ew girtibe, lerizî. Çavên wî hingî fireh bûn, dikira ji serê wî baz bidaya. Her deverên wî, bi carekê pûç bûbûn. Got qey di ci-hekî de asê maye û nikare xwe xelas bike. Bîhna wî dikira biçikiya.
Xwendina kaxizê beyî hişê xwe domand.
97
REŞ Û SPÎ

Belkî ez li wan deveran, ji xwe re çareyekê bibînim.
Belkî jî ez bêtir di nava vî derdê giran û kerba dilî de vegevizim. Ez hew dizanim.
Gava ko ez van rêzikan dinivîsînim jî tiliyên min dilerizin. Ji xwe, tu ê ji nivîsa min
têbigihêjî.
Hespê har rabûye ser piyan, Robîn. Guh nade tu tiştekî.
Divê ez herim.
Yan na,

Ez ê ji kerba xwe dîn bibim û tiştin xerab bi xwe bikim.
Ez ji vê yekê pir ditirsim…
Min ji te re got. Tu deng ji te derneket.
Xwezî tu jî bi min re bihatayî...
Li xwe miqate be.
Bişar
Robîn di cihê xwe de mat ma. Bûbû wek ko mirov kûzeke ava sar bi ser de dakiribe. Bawer nekir. Berê, xwast xwe bixapîne û got qey hevalê wî henekekan bi wî dike. Lê wî bi xwe jî bawerî bi tiştê ko lê difikirî neanî. Tevî vê jî demeke dirêj, bi bêsebiriyeke mezin li benda Bişêr ma. Hisên weha cida û tevlihev ew dabû ber xwe ko carinan hêvî pê re çêdikirin û carinan jî ew bi yekcarî bê hêvî dihişt.
Bêhna wî teng bûbû. Carê radibû û diçû ber pencereyê, li derve dini-herî û dîsa dihat, li şûna xwe rûdinişt. Her ko diçû, hêviya wî bêhtir qut dibû, lê tevî vê jî ji bo ko bi temamî bê hêvî nemîne, hewil dida. Guhê wî her li derî bû.
Du saet derbas bûn. Robîn li ser hevdu çixare ji pakêta li ber xwe dik-işand û vêdixist. Xwelîdankek tije boçik kir. Deng ji derî nehat. Mîna ko di nav valahiyekê de mabe, xwe li ser piştê dirêj kir û ma.
Bişar venegeriya. Wê gavê, Robîn têgihişt ko ew hew vedigere. Dîsa çû li şûna xwe rûnişt û çavên wî li kaxizê, ponijî. Çûna Bişêr û bêdengiya hindur, ew xistibû nav valahiyeke bêsînor. Bi tenê mabû. Mîna ko kêrek lê ketibe, dilê wî diêşiya.
Ji derveyî Bişêr, tu hevalê wî tune bû. Wî jî ew terikand û çû. Acizî, bitenêtî, neçarî… Giş tev li hev dibûn; dibûn gulokeke mezin û xwe li dilê wî dixist.
Robîn ew rêzikên dawiyê yên kaxiza ko Bişêr hiştibû, dîsa xwend.
98

Xwezî tu jî bi min re bihatayî…
Bihata kû? Bişêr mîna ko şîfreyek an jî işaretek hiştibe, nivîsandibû. Lê, eşkere nekiribû. Fikirî. Ew bûya, ew ê biçûya kî derê? Ma yekî di rewşa Bişêr de be, dê bixwaze biçe kî derê. Cihekî din, bajarekî din? Welat?… Şer?… Diyarbekir?…
Wî jî nizanîbû, bê ev tişt giş ji kû dihatin bîra wî. Mîna ko romaneke polîsiye bixwîne, fikirî. Tiştên ko hatin bîra wî, ew ji wan ramanan dibir devereke din. Çima Bişêr xwastibû ko ew jî bi wî re biçe? Ma qey wî jî tiştekî weha dixwast? Çima çer ko li ser çûyinê fikirî, hema Diyarbekir hat bîra wî?
Pakêta ber xwe vala kiribû. Paketeke din ji bêrîka xwe derxist. Çixareyek pêxist. Destê xwe da eniya xwe û fikirî. Çi tiştên ko li ser navê Diyarbekirê dizanîbûn, giş hatin bîra wî.
Zarokatiya wî, lîskên wî yên li ber deriyan, şerên wî, hevalên wî, evînên wî û bitenêtiyên wî. Seydoyê ko hertim tê xewna wî û bangî wî dikir, Selmanê ko derketiye çiyê û niha kî dizane, bê li kû ye, Şêxoyê girtî, Hemdînê kuştî, Eliyê ko dilê wî jê mabû û çûbû… Nûşîna ko her di bîra wî de bû… Çavên wê, ruyê wê yê xweşik, porê wê, bêhna wê, bejna wê ya zirav… Bêrikirinên wî, helbestên wî, tirsên wî… Wê roja ko ew ji welêt derketin... Xwastina wî ya çûyinê ko heta niha ji herkesî veşartibû û belkî heke ne ji vê nameya Bişêr bûya jî wî dê bi qasî niha serê xwe pê neêşandaya...
Dilê wî careke din êşiya. Li ber xwe ket. Zikê wî bi wî şewitî. Kela girî ket qirika wî. Çavên wî sor bûbûn. Ji bo ko negirî, dev li lêva xwe dikir. Dîsa jî nikarîbû xwe bigirtaya. Çixareya xwe vemirand û yeka din ji pakêta li erdê kişand û xist devê xwe. Hilmeke kûr bi keserê re kişand û ma.
Dilê wî bûbû wek bombeyeke ko pîmê wê hatibe kişandin. Ji bo teqînê

li hemanan bû. Hê jî diricifî. Li xwe heyirî. Li hespê har ko Bişêr behsa wî kiribû, fikirî. Gulpeke din ji çixareya xwe kişand. Destên wî mîna ko bi cereyanê ketibin, dilerizîn. Serê xwe xist nava herdu destên xwe û ma. Bi dû re, bi dengekî lerzokî, hêdîka di ber xwe de got, »heqê ez jî bi te re bi-hatama…«
Rabû ser piyan, situyê xwe xwar kir û rahişt qapûtê xwe. Derî li pey xwe kişand û derket derve. Berê xwe rast da rawestgehê. Heta ko ji malê bi dûr
ket jî digot qey ew ê aniha Bişar ji nişka ve derkeve û bangî wî bike.
99
REŞ Û SPÎ

2. Di xelasbûna her evînê de, dîroknivîs pênûsên
xwe dişikînin...
»Evdal im binêr hemû çiya digo çiya ne
Heyran çiya digo em çiya ne
Çavên reş û belek
Dinya alemê Xwedê zane çend bela ne, dimirim ax
Ay li minê ax ay Xwedê.
Herkesî dost û yarê xwe girtine
Wê kafir û kafirbavê
Kî xwe girtiye ez û tu terk dane
Xirabmal im yeman bendewar im yeman
Ax ez aşiq im dîno...«
Dinya sar bû. Berfa ko ji do de nesekinîbû û li eniya kesên ko dimeşiyan dixist hê jî dibariya. Bayê kur hê jî dom dikir. Mirov digot qey tofaneke ecêb rabûbû.
Hemû mekîneyên ko di ber wî re derbas dibûn, tije bûn. Rêwiyan gişan

di caman re li berfa ko dibariya temaşe dikir. Berfê nedihişt ko mirov ber xwe bibîne. Ji ber wê, mekîne hêdî hêdî diçûn.
Heta ko otobusa ew ê lê siwar bibûya hat, Robîn ji serma qefilî. Lêvên wî qeşa girtibû. Bêvila wî bûbû mîna gêzerekî. Guhên wî hingî sor bûbûn ko wî digot qey ew ê aniha jê bikevin. Pişta wî bûbû mîna ko tu derziyan tê re rakî. Çongên wî dilerizîn. Tiliyên lingên wî hew diliviyan. Çer ko deriyê otobusê vebû, xwe bi lez avêt hindurê wê.
Çû weke hercar li paşiyê, ji xwe re cihek zeft kir û rûnişt. Berê xwe da camê.
Nameya Bişêr û çûyina wî, Diyarbekir xistibû bîra wî. Hê li rojên xwe yên li Diyarbekirê difikirî; bêtir jî roja ko cara dawîn ew bi Nûşînê re li parkekê rûniştibû.
Rojeke havînê ya germ bû. Li ser maseya hercar, li bin siya dara mezin rûniştibûn. Herduyan jî ji zû de hevdu nedîtibû. Robîn bi hemû hezkirina dilê xwe li wê diniherî. Lê Nûşînê, ne Nûşîna hercar bû. Nedipeyivî. Li wî nediniherî. Wek hercar nedikeniya jî. Her li deriyê parkê diniherî û diponijî. Dixwast ko zû bi zû rabe û biçe qey...
Robîn têgihiştibû ko dixwaze dev ji wî berde, bes bawer nedikir. Ew ji xwe re difikirî ko piştî ewqas tiştên ko bi hev re kiribûn, dê çawa bikarîya
100

dev ji wî berdaya.
Ji salekê zêdetir çêbûbû ko wan ji hevdu hez dikir. Gelek caran li deverên weha, li ser bircan li hezkirina xwe mukir hatibûn. Gelek caran bi hezar derewan malbata Nûşînê xapandibû û li malên hevalên xwe yên xwendekar li cem hev razabûn. Gelek caran heta sibehê, di himbêza hevdu de, bi hev re şiyar mabûn. Gelek caran, Robîn helbestên xwe ji wê re xwendibûn. Îja niha, ew ê ji hevdu veqetiyana û Robîn bi vêya dizanîbû.

Digel ko hê mîna rojên ko heta sibehê di hembêza hevdu de diman ji wê hez dikir jî ew ê ji hevdu veqetiyana. Belkî jî ji wan rojan bêtir…
Ji xwe ev demeke dirêj bû ko dengê hevdu jî nebihîstibûn. Çend caran Robîn telefonî mala wan kiribû jî Nûşîn yan ne li malê bû, yan jî karekî ko destê wê jê nedibû dikir. Tu carî nedihat ser telefonê. Cara dawiyê ga-va hatibû jî ji bo ko hevdu bibînin û li ser tiştekî girîng bipeyivin, civan dabû Robîn.
Robîn xwe dabû benda wê ko ew tiştekî ji wî re bibêjê û dilê wî rehet bike. Heta ko ji devê wê nebihîstaya jî dilê wî nediket cih. Robîn bi kerb bû, xemgîniya xwe ji ruyê wî û niherînên wî dida der. Meraq dikir. Di ber re jî ditirsiya ko têkîliya wî û Nûşînê biqede. Qey gava mirov ji hinan hez bike, hema ditirse ko ew kes dev ji wî berdin û herin. Ji ber vê yekê, got:
— Tu çima ji min direvî, Nûşîn?
Nûşîn ji xwe li benda pirseke weha bû û bersiva xwe jî ji berê de amade kiribû. Lê, devê wê negeriyabû ko bigotaya. Xwe bi ser hev de civandibû, berê xwe dabû wî. Lêva xwe xwar kiribû, keserek kişandibû û gotibû:
— Hin problemên min hebûn. Ji ber wê ez li te nedigeriyam.
Robîn bi hemû dilsafiya xwe gotibû:
— Te dikarîbû ji min re bigotaya. Ma qey çi ji destê min bihataya, min ê ji bo te nekiraya?
Ev peyv bi awayê ko li ber wê bigere, ji devên wî derketibûn.
Nûşînê dîsa kiribû ufe uf û gotibû:
— Tu min fahm nakî, Robîn.
Bi dû re jî mîna ko ji berê de peyvên xwe ji ber kiribû, li pey hev rêz kiribûn.
— Binihere, Robîn. Tu kesekî pir baş î. Ez hê jî ji te hez dikim, lê ne weke berê. Ew hestên min yên berê nemane…
Ew peyv bûbûn mîna kelemekê û di dilê wî de rabûbûn. Wî ê ev peyv

tu carî ji bîr nekirana. Ziq li çavên wê niherîbû. Mîna ko kûzeke ava sar bi ser wî de hatibe dakirin, mat mabû. Belê, tirsa wî rast derketibû. Çawa

qesirek ji binî ve bihedime, ew jî weha bûbû. Digot qey tiştin di hindurê wî de ji hev diqetin. Gava têgihiştibû bê Nûşînê dixwast çi bibêje, beyî ko bizanibe bê ew ê bi dû re çawa li ber bikeve, peyva wê bi carekê ve birîbû û gotibû:

— Hela bisekine, bisekine! Ev tu çi dibêjî?

— Ez dibêjim ku…

Êdî dilê Robîn ketibû cih. Ne hewce bû ko Nûşînê tiştekî din bigotaya. Dîsa peyva wê birîbû û hêdîka gotibû:

— Binihere, Nûşîn. Min nexapîne û peyvê dûdirêj neke. Ez ê carekê bi tenê bipirsim. Tu jî peyvekê bi tenê ji min re bibêje.

Ma çawa dikarîbû dev ji wê berdaya. Ma qey wî ê ev roj û ev peyvên ko hatibûn kirin, qet bikarîbûya ji bîr bikirana? Sozên ko dabûn hev hatibûn bîra wî. Demên ko di himbêza hev de bûn û devên wan di devên hev de bûn, mîna filîmekî di ber çavên wî re bihurîbûn. Xwastibû hema wê gavê rabûya û bi hemû hêza xwe biqêriya û bigotaya:

— Ez ji te hez dikim…

Xwe bi zorê zevt kiribû. Ji bo ko neqîre, dev li lêva xwe kiribû. Bi dû re, dîsa li çavên wê niherîbû û gotibû:

— Tu dixwazî ko ev têkiliya me xelas bibe, Nûşîn?

Lê di ber re jî gava ko li benda bersiva wê bû, di dilê xwe de li ber wê di-geriya û digot:

— Dev ji min bernede, Nûşîn. Min terk neke...

Rengê ruyê Nûşînê yê xweşik ji nişka ve hatibû guhertin û zer bûbû.

Wê bi xwe bawer nedikir ko dê ewqasî zû biqediyaya. Mîna ko li yekî biyanî binihere, li wî niherîbû û mabû. Tiştek negotibû. Bi tenê, serê xwe bi mahneya ko bibêje »erê«, kil kiribû û bi awayê ko ew ê tu carî ji bîra Robîn neçûya, gotibû:
— Hi hi…
Wê gavê, Robîn hema destên xwe mîna ko mirov karekî xelas dike, li hev xistibûn û bi awayekî liberketî gotibû:
— Hingê weha be, tu çima dirêj dikî? Baş e, bila xelas bibe.
Lê belê, hê jî di dilê xwe de digot:
— Na, Nûşîn! Ez bi qurbana te bim, dev ji min bernede... Nûşîn, dev ji min bernede...
Nûşîn careke din şaş mabû. Ew li bende bû ko Robîn li ber wê bigere. Wê nehesibandibû ko Robîn dê xelasbûna vê têkîliyê ewqasî bi rehetî bipejirîne. Ji bo ko Robîn zêde li ber nekeve, wê hin peyvên din jî di serê
102

xwe de amade kiribûn.
Vê carê wê peyva Robîn birî:
— Lê belê, ez beriya wê, dixwazim tiştekî ji te re bibêjim.
Robîn tavilê ew dabû sekinandin. Ruyê wî jî zer bûbû.
Gotibû:
— Tiştekî ji min re nebêje, Nûşîn. Ez nikarim li tiştekî din guhdarî bikim. Min berê jî ji te re gotibû. Gava ko tu ji min aciz bûyî, tu ê bi-hatayî cem min û beyî ko peyvê dirêj bikî, te ê ji min re bigotaya. Êdî, bes e. Tiştê ko te got, temam e. Hewce nake ko tu lê zêde bikî.
Lê dilê wî weha nedigot.
Dilê wî digot:
— Bipeyive, Nûşîn. Ji bo Xwedê, bipeyive û dilê min rehet bike...

Nûşînê weke ko bibêje, »tu dizanî… yê min ne xema min e«, lêva xwe xwar kiribû, milên xwe kil kiribûn û tu tiştekî din negotibû. Robîn serê xwe bera ber xwe dabû. Digot qey xelk giş li wan dinihere, şerm kiribû, pir li ber xwe ketibû. Xwastibû hema zû bi zû xwe bigihandaya deverekê, serê xwe daniya û têra xwe bigiriya. Çavên wî tijê hêsir bûbûn. Heke peyveke din kiribûya, ew ê giriyabûya.
Bîstikekê, bi wî awayî li hember hev rûniştibûn. Nûşînê ziq bala xwe dabû wî û ji bêdengiya wî tirsiyabû ko Robîn tiştekî xirabtir bike ko her-du jî di nav xelkê de bihetikin. Lê belê, Robîn tiştek nekiribû. Hew peyivîbû jî. Piştî bîstikekê, gava ko bêhna wî hebekî hatibû ber wî, careke din serê xwe rakiribû û dîsa weke ko li ber wê bigere, li çavên wê niherîbû. Wî dê ew nêrîna dawiyê tu carî ji bîr nekiraya û tu carî nizanîbûya bê ji bo çi têkîliya wan bi dawî bûbû. Ji ber wê, her ko bihataya bîra wî, weke ko birîna wî bi kêreke zingarî were kolandin, dilê wî dê biêşiyaya. Carinan, gava li vî bajarê dîrokî, berê xwe bidaya dîwarên qesir û qon-axên ko bêhna demên kevin ji wan dihat, wî ê her bigotaya qey nivîsek hebû ko lê hatibû kolandin. Nivîseke kûrkolandî. Ji ber vê yekê, serê wî dê biêşiyaya, bêhna wî dê teng bibûya. Ew ê li ber xwe biketaya, kelogirî bibûya û çavên xwe di nivîsa ko wî digot qey di dîwêr de hatibû kolandin de, cit bikirana:
… û yê herî egîd jî nikarîbû li ber jana evînê debar bikira…
Piştî wê cara dawîn ko bi Nûşînê re peyivîbû, berî ko werin vî bajarê mezin, careke din jî ew li sûkê dîtibû. Lê ji bo ko li çavên wê nenihere û

kula dilê wî dîsa tev ranebe, çi qasî bi wî bi tahde bûya jî serê xwe bera ber

xwe dabû û di ber wê re bihurîbû. Herçî Nûşînê bû, li wî hay bûbû û heta ko jê bi dûr ketibû jî li xwe zivirîbû û di pey wî re niherîbû. Ji wê rojê û bi şûn de, zewac jî û evîn jî dê li Robîn heram bibûna. Heta ko ew li Gulcanê rast bihataya, rewşa wî dê her weha bûya.
Niha jî gava ko di otobusê de, serê xwe dabû camê û li wê roja berê û wê niherîna dawîn difikirî, hingî dilê wî diêşiya, çavên xwe girtibûn û dev li lêva xwe kiribû. Jana dilê wî xwe di ruyê wî de dabû der. Bi dû re, çavên xwe yên sorbûyî vekirin û du niqut hêsir, bi ser hinarikên ruyê wî de, hêdîka bi ser hev de gindirîn.
Ev çend roj çêbûn ko li Gulcanê jî negeriyabû. Ji cerga ko hevalê wî Elî hatibû û ji wî re behsa Nûşînê kiribû û vir de, hew carekê bi tenê çûbû cem Gulcanê. Wê rojê, ji wê re gotibû »ez ji te hez dikim.« Lê belê, niha wî jî bi xwe hew dizanîbû bê ka ji kê hez dikir. Ji lewre, carinan dilê wî jî bi Gulcanê dişewitî.
Gulcan… Keçika esmer… Lihevhatî... Bedew… Narîn... Yar û hevala rojên bitenêtiyê… Keçikek û xweşikbûneke dilrevîn... Evîndara nedîtî… Nûşîn… Keça Kurdan... Hezkiriya kevin… Niherîna wê ya dawîn… Çavên wê… Birîna dil… Qêrîneke dil ya veşartî… Sernavê kul û der-dan… Evîna nîvcomayî... Jana herî mezin… Kerb…
Kerb…
Kerb!..
Ji xwe aciz bûbû. Lahnet li dinyayê û li hemû tiştên wê dianî. Hêrs bûbû. Dilê wî dîsa tije bûbû. Dikira biteqiyaya.
Rabû ji mekîneyê daket. Di bin wê berfa ko nedihişt mirov ber xwe bibîne de, heta malê, di ber xwe de giriya û meşiya. Hişê wî ne li serê wî bû. Çi kevirê ko bihataya ber wî, weke ko kerba xwe ji serê wî derxîne, bi hemû hêza xwe pehînek lê dixist û bêtir dida girî.
Carekê destê xwe bir ber çavên xwe û hêsirên xwe paqij kirin. Bi dû re

dîsa meşa xwe domand û xwe di newala kûr a fikiran de werkir. Dinya anî bîra xwe, jiyan anî bîra xwe, civat anî bîra xwe, têkîliyên mirovan, hevaltiyên wan, hezkiriyên wan, evînên wan, derewên wan û hevxapandinên wan... Wek ko hemû li hember wî bin û ew jî xwe ji vê minaqeşeyê re amade bike, fikirî. Hem digiriya û dimeşiya, hem jî difikirî. Ji ser hişê xwe ve çûbû û berê xwe şaş kiribû.
104

3. Nefîkiriyê dinyaya xwe...
»Ez di nav wan de me, lê ez ne ji wan im.«, Byron
Ez li vê dinyayê najîm. Erê, ez li vê dinyayê me, erê bedena min li vira ye û erê herkes dibêje qey ez jî wek wan dijîm; lê dîsa jî tu têkîliyên min bi jiyana vê dinyayê re tune ye.
Du dinyayan bînin ber çavên xwe. Du dinyayên ji hev cida… Herdu jî di nav hev de ne. Gava mirov lê dinihere, mirov dibêje qey herdu jî yek in. Lê heke hûn jî weke min li derveyî herdu dinyayan bimînin, wê çaxê hûn ê fahm bikin ko hertişt ne wek wê rastiyê ye ko em pê dizanin.
Ez nikarim derewan bikim. Ne ji bo ko ez bi xwe re dipeyivim, ha! Ez dizanim ko niha hûn li min guhdarî dikin. Erê dengê min dernakeve derve, lê ez baş dizanim ko hûn jî bi qasî min dengê min dibihîsin. Belkî jî hûn ji min çêtir dibihîsin.
Ez najîm, lê ez ne mirî me jî. Beyî ko ez jî bizanibim, bê ji ber çi sedemê ye, ez li ser ruyê vê dinyayê, bêserî diçim û têm, diçim û têm... Mînaînsanên din. Belkî piçekî ji wan cidatir, lê dîsa jî mînaînsanên din.
Mîna ko di nava du dîwaran de asê bûbim, mîna ko di binê bîreke kûr de mabim... Hawîrdor reş û tarî. Serê xwe radikim ko li ezmanan binerim, lê ezman xuya nabin.
Aniha, heke hayê dinyayiyan jê hebe, ew ê bibêjin qey ez behsa wê

dinyayê dikim ko mirov di serê xwe de ava dike, ne weha? Na, na; ez behsa wê dinyaya ko herkes pê dizane nakim. Ji xwe, heke weha bûya, min ne serê xwe diêşand û ne jî yê we.
Erê, ez jî dizanim ko carinan mirov di serê xwe de dinyanin cida ava dike û ji xwe re di wira de dijî, têkîliyên xwe ji hemû dinyayên din û jiyanên din qut dike. Di salên xortaniya xwe de ko ez hêdî hêdî li xwe hay dibûm, belkî jî wê gavê ez ji xwe bi dûr diketim, min fahm kir ko herkes li gora xwe û dinyaya xwe dijî. Lê tiştekî din jî heye: Dinyaya herkesî li dora wî dizivire. Hertiştên wê dinyayê li ser wî û li gora wî hatine çêkirin. Heta, tişt miştên ko gava em bifikirin û qet nayên bîra mirov jî…
Belê, baweriya min bi zanebûna we tê û ji ber wê, ez dibêjim qey we jî heta niha fahm kiriye. Jiyan filîmek e. Filîmekî dûdirêj. Û her kesek jî filîmekî wî heye. Herkes di filîmê xwe de serleheng e. Hemû bûyer û mekan, ji bo ko filîmê wî li gora senaryoya ko xwedêgiravî ji berê de hatiye nivîsandin dewam bike û ji derveyî senaryoyê tiştêk pêk neyê, ji

berê de tên amadekirin. Rola herî mezin ya wî kesî ye. Hemû însanên din jî di filîmê wî de fîguran in. Dor bi dor tên û diçin... dimirin an jî terk dikin.
Îcar de bifikirin. Mirov bi qasî barê heft hespan pirtûkan binivîsîne, an heft rojan li civatekê nesekine û bibêje jî têrê nake.
Mesela, ka bala xwe bidinê, carinan di jiyana mirov de tiştin weha pêk tên ko hişê mirov jî bi xwe nagihêjê. Mirov sed salî jî bifikire, tiştekî bi wî rengî nayê bîra mirov. Lê ji nişka ve ew bûyer pêk tê û bûyera ko mirov jê re dibêje tesaduf, an jî rastlêhatin, hemû jiyana mirov diguherîne. Ma ne weha ye? Rahme li bavê we!

Tê gotin ko senaryoya filîmê mirov ji berê de hatiye nivîsandin. Hê gava ko nuh em ji diya xwe dibin, kamera dest bi karê xwe dike. Senaryo, rol, tîp, bûyer, dîalog, hûnandin, sahne, dekor û kamera… Mirov jî tê, li wê sahneyê cîhê xwe digire û çîrok dest pê dike. Tu û şensa xwe...
Ma ger hertişt ji berê de hatibe plankirin, çi şensa mirov dimîne? Ez jî nizanim. Tiştê ko ez dizanim ev e ko ez li senaryoyeke ko ez bikaribim tesîrê lê bikim digerim, roleke weha ko ez bikaribim hilbijêrim, bûyerin weha ko ez bi îradeya xwe beşdar bibim…
Ez dizanim bê hûn ê di vira de çi bibêjin. Erê, ez jî dizanim ko Xwedê gava dide mirov, nabêje tu lawê kê yî. Lê ez dibêjim qey ev rewşa ko ez tê
de me, hebekî dûrî karê Xwedayan e. Ez ji çi çaxî de di vira de me, hûn dizanin? Ez ji çi çaxî de bi kesî re nepeyivîme?
Niha, ez ne ez im êdî. Ez yekî din im. Lê ez wî yekê din nas nakim. Bi rastî, ew jî xwe nas nake. Gelo ez kî me? An kî ez im? Gelo ez bi rastî yekî din im? An yekî din ez im? Carinan ez ji xwe dipirsim, bê hela kîjan ji me ji yê din baştir e. Lê her yek li dinyayeke din dijî, herkê jiyaneke wan heye. Bîr û baweriyên wan, xusûsiyetên wan, niherînên wan, rabûn û rûniştinên wan, çûyin û hatinên wan û tevgerên wan naşibin hevdu. Ne wek hevdu ne, yanî. Min lê niherî ko nabe, min dev ji herduyan jî berda.
Her çi qas niha bi zorê were bîra min jî ez berê zarokek bûm, lê aniha ez hatime guhertin. Û ez dibînim ko çerxa felekê jî bi min re hatiye guhertin. Niha gava ez li xwe dinerim, dilê min bi min dişewite, bi Qur’an, bi wê Qur’ana ko çi îmana we pê bê, an jî neyê. Yekî mîna min... Yekî mîna min ko herkesî dixwast bibûya wek wî. Pîrekên taxê, gava dihatin çav li min diketin, hema digot ax û ji diya min re digot, »Xweziya me bi dilê te ko lawekî te yî weha heye.«
Ez jîr bûm. Jêhatî bûm. Him di xwendinê de û him jî di şer de, kesî

nikarîbû zora min bibiraya. Ji ber ko rojekê min kêr li du serseriyên ko dihatin taxa me û bela xwe di zarokên taxa me dida kişandibû, navê min zû belav bûbû. Hê di zarokatiya xwe de, gava ez derdiketim derve, hemû zarokên wê der û dorê, ji bo ko hevaltiyê bi min re bikin bi hev re şer dikir. Yê min, min ji nav wan ji yên herî bijarte hez dikir. Min bi tenê hevaltî bi wan re dikir. Ji ber wê jî hê ez duwanzdehsalî bûm, hin îşaretên vê tenêtiya min dest pê kir û ez ji der û dora xwe hêdî hêdî bi dûr ketim. Lê tevî vê jî heval û hogirên ko ez bi yekcarî bi tenê nehiştim jî hebûn. Ên ko me bawerî dida hevdu. Ên ko em ji hevdu re dibûn pişt. Ên ko me bêyî hevdu debar nedikir. Ên ko em niha heryek bi devereke de belav bûne… Berê, herkesî bi serê min sûnd dixwar, tu barê ko min nikarîbû hilgirtaya tune bû. Lê aniha..? Aniha ez bûme wek miriyekî. Tiştek di min de nemaye. Ez dijîm, an najîm, ew jî ne xema kesî ye. Belkî jî ne weha ye û ez dilê xwe bi xwe dişewitînim; lê ji derveyî vêya jî tiştekî din nayê bîra min.

Kesek nikare pê bizanibe bê hêrseke çawa heye di dilê min de.

Li dinyaya we, kesî ez nas nedikirim. Dîsa jî min herkes nas dikir. Ji ber ko gava ez derdiketim derve, min çavên xwe digerandin û li dora xwe diniherî. Mîna ko kamerayek di destê min de be, min jiyana we giş qeyd dikir. Lê min bi awayekî weha qeyd kiriye ko gava hûn lê temaşe bikin, hûn ê xwe nas nekin. Ji ber ko ruyê wan kesên ko di dîmênên jiyana we de ne, tune ye. Min aliyê dinyaya we yî bêdeng kişandiye. Yanî min tevliheviya dinyaya we kişandiye. Lê hûn ê di wan dîmenan de, bêdengiya xwe bibînin. Belkî hûn ê bigirîn, belkî jî hûn ê henekên xwe bi xwe bikin. Wek ko aniha ez dikim.

Wê gavê, ez bi tenê bûm. Sibehê zû derdiketim. Carinan min taştê jî

nedixwar. Ji bo min bûbû tebîetek. Ez her sibeh derdiketim û diçûm, min xwe bera nava jiyana we dida. Her êvar serê min di ber min de, ez vedigeriyam malê. Gava min dixwast ez ji we û jiyana we ya herimî bi dûr bikevim, hema wê rojê ez ji nava nivînên xwe dernediketim. Min newêrîbû çavên xwe vekirana. Gava min çavên xwe vedikirin, her yek ji we dibû pîrhebokek û bi ser min de dihat. Gava ez di xewê re biçûma jî kabûs dihatin min. Li aliyekî cin û pîrhebok û hûn, li aliyekî jî kabûs û ez bi tena serê xwe...

Kesî ji we ez fahm nekirim. Gava ez dipeyivîm, we gişan serê xwe kil dikir û li min guhdarî dikir, lê mîna ko ez bi zimanekî din peyivîbim, yekî ji we tiştek ji devê min fahm nedikir. Ji bo ko ez bi we bidim fahmkirin û

107

REŞ Û SPÎ

hûn alî min bikin, min qirika xwe çirand, dilê min werimî, ez behecîm, lê we fahm nekir. Pê re hêdî hêdî têkîliyên me qut bûn. We jî hin têkîlî qut kirin. Hin jî min qut kirin. Belkî weha çêtir bû. Him ji bo we û him jî ji bo min…

Ez êdî bi xwe re dipeyivîm. Min derdê xwe ji xwe re digot û min li xwe guhdarî dikir, lê ji bo ko ez xwe xelas bikim, tiştek ji destê min nedihat. Min xwe himbêz dikir û pişta xwe difirkand. Kesek tune bû ko min derdê xwe jê re bigotaya. Ne hevalekî ko ez serê xwe deynim ser milên wî û bi-girîm, ne jî dostekî ko bikaribûya ji min fahm bikiraya an jî ez bikaribim pê bişêwirim…

Heta demekê, keçikeke ko bikaribe himbêza xwe ji min re veke û derdê min bi min bide jibîrkirin jî tune bû. Çi ji min hat, min kir, belkî jî min qet tiştek nekir, lê her çi be, min dîsa jî keçikeke xweşik ko hema carekê bi tenê li min bizivire û li hindurê çavên min binihere nedît. Agir bi keze-

ba min diket. Min çi bêriya germahiya canê jinekê kiribû, hûn nizanin. Carinan min hertişt ji bîr dikir û ez bi tenê bi wê hesretê dinaliyam ko ez şevekê heta sibehê di himbêza jineke xweşik de bimama, min serê xwe daniya ser memikên wê û di xewê re biçûma. Heta ko min Gulcan nas kir, ez bi vê hesretê şewitîm. Niha, ne bi temamî be jî Gulcanê ev hesret di dilê min de sivik kiriye. Lê ez nizanim, dîsa jî tiştin di dilê min de tev dilivin. Dilê min dîsa jî tiştinan dixwaze, bi hesreta tiştin din dişewite. Min pir li ber xwe da, tu rê nema ko min neceriband. Lê, nebû. Piştî ko min lê niherî ko ez çi qasî di ber xwe de bidim jî belasebeb e, êdî min jî dev ji xwe berda. Min got, hema çi dibe bila bibe, belkî çêtir bibe.
Niha ez ji hemû dinyayê xeyidîme. Ez bi tena serê xwe li dinyaya xwe dijîm. Heke hûn rastiyê bixwazin, ev ne dinyaya min e jî. Belkî ya yekî din e û xwediyê wê niha ne li vira ye. Belkî jî carê yek, dor bi dor, em tên vira û diçin. Ez nizanim.
Belê, êdî jiyana min naşibe ya we. Ew ê tu carî jî neşibiyê. Ji ber ko em nema ji hevdu fahm dikin. Ne ez ji we fahm dikim, ne jî hûn ji min fahm dikin. Ez nema bi henekên we dikenim. Hûn jî nema bi yên min... Ji lewre, ez jî henekên xwe ji xwe re dikim. Ez bi xwe derdikevim sahneyê û li xwe temaşe dikim û bi xwe dikenim. Hingî kêfa min ji henekên min re tê, ez ji kena bi zikê xwe digirim û li ser piştê li erdê dikevim. Di ber re jî ez ji xwe re dibêjim, heke hayê însanên din ji van henekan hebûya, ew ê ji kena bimirana, weleh!
Min têkîliyên xwe yên bi dinyaya we re qut kirine. Li gora we, niha ez
108

najîm. Lê ez li wira me, li cem we me. Wek siyekê, wek xeyalekê di nav we de digerim... Belkî hayê we ji min heye, belkî ne xema we yekî ye jî. Belê, ez najîm. Di navbera du sahneyan de diçim û têm. Li herdu sah-

neyan jî filîmên min dilîzin; lê herdu filîmên min qet naşibin hevdu. Kesê ko ji dêleva min di wan filîman de dilîze, an jî kesê ko herkes dibêje qey ez im, an jî ez... Ew zilam ne ez im.
Ez nema dikarim vegerim dinyaya we. Ne di destê min de ye, em wek hevdu najîn. We xwe hişk bi jiyanê girtiye. Hûn ji jiyanê hez dikin. Lê ez... Hema ez ji we re bibêjim û bila dilê we rehet bibe: Heke jiyan ev be, îmana min ji we û jiyana we diçe!
Hertişt li aliyekî, ez ê çawa bikaribim xwe xelas bikim, ez nizanim. Min çavên xwe girtin û vekirin, min dît ko çerxa felekê bi carekê ve hatiye guhertin. Ez gêj bûbûm. Mîna ko şev li min geriyabe û ez dewx bûbim, min hema çavên xwe bi tirs digerandin. Lê belê min heta niha ne vî warê xwe yî nuh nas kir û ne jî min riya vegerê dît.
Rojekê ez ê bimirim, yanî ez ê bi temamî bimirim û xelas bibim. Bi dû re herkes dê bimire. Hinên din dê werin şûna me. Yanî em ê bimirin û biçin. Yanî tu tişt ji me namîne. Yanî em belasebeb dijîn? Aha ez vêya qe-bûl nakim, ha!
Îro ez heme, lê sibehê tune me. Yanî kî bimire ji kîsê xwe diçe? Ya ko li zora min diçe jî ev e, ji xwe...
Ez kî me, çi karê min heye li vê derê, çawa hatim vira, herkes li kû ye, çima kesek dengê min nabihîse, çima em mecbûrin ko bijîn, çima em ê rojekê bimirin?.. Em li vira li çi gûyê xwe digerin, em ji bo çi dijîn?
Niha ez nizanim bê ez ji bo çi dijîm. Gelo hûn dizanin? Lê tiştek bi tenê heye ko niha ez pê dizanim; ez êdî ne ez im.
Heke ez ez bim jî ez bi tenê me. Bi tena serê xwe… Di dinyayeke xalî de… Qesasê bitenêtiya min »ne diyar« e. Ez di destên »qesasnediyaran« de, ne di tu halî de me.
Niha hat bîra min. Belê, baş hat bîra min. Berê, min ji we fahm dikir û we jî ji min. Berê, me bi hevdu re xwe li dinyayeke hevbeş radikişand.

Berê, ez bi henekên we dikeniyam û hûn jî bi yên min… Lê çi bû? Çi bi me hat?
Ma çi bi me nehat, lo!.. Erê, erê… Ji bo her yarekî »qesasnediyarek«...
Dil şikestin. Situ xwar man. Agir bi warekî ket. Dixan ji deverekê çû. Pêleke koçberiyê… Tofaneke tirsê. Xezebeke dîsa »qesasnediyar«… Lehîyek. Lehîyeke sor. Lehîyeke ko dil kirin gor…
109
REŞ Û SPÎ

Û ez serê we zêde neêşînim, dinya li dereke teng li me çû ava, du çavên ez bi hesreta xwe hiştim, cara talî li dinyaya gewrik niherî û xezebê hêlîn li ber gelek dilan xera kir û dilên neçar, dilên peritî xwe li tariya biyanistana bêbext girt.
Haho, ma ev ne bes in? Ma hîn dê çi bibe?
4. Kîjan...?
wecihê te Diyarbekirê tîne bîra min...
Qerisîbû. Gava ko li xwe hay bû, dît ko ji zû ve di ber malê re bihuriye. Mal li dû wî mabû. Çavên wî werimîbûn. Hêsirên wî li ruyê wî qeşa girtibûn. Ji sermayê dilerizî. Diranên wî li hev diketin. Ji şeq şeqa diranan pê ve, tu tişt nedibihîst. Vegeriya û heta ko gihîşt malê, dilê xwe bi xwe şewitand û ponijî. Hingî di bin wê sermayê de mabû û ji hal de ketibû, çer ko gihişt malê, serê xwe danî û raket.
Ta girtibû. Di xew de dinaliya. Gava ko diya wî Leyla Xanim bi dengê nalîna wî hisiyabû, çûbû odeka wî û heta sibehê li ber serê wî rûniştibû. Xew ketibû çavên miriyên mezelan, lê neketibû çavên wê.
Kincên lawê xwe yên ko ji ber xwêdana wî tev şil bûbûn, ji wî kiribûn û yên zuha lê kiribûn. Her ko Robîn dinaliya, Leyla Xanimê destê xwe di eniya wî ya fireh de dida, porê wî mist dida û di ber xwe de digiriya. Dilê

wê bi lawikê wê dişewitî.
Robîn herroj bê serî derdiket derve û êvaran ruyê wî daliqiyayî dihat malê. Carinan jî diket odeka xwe û heta êvarî deng ji wî nedihat. Êdî mî-na berê, bi Serdar û Meryemê re jî elaqadar nedibû. Acizî û bêhntengiya wî li malê, bala herkesî dikişand.
Robîn heta sibehê bi xwe nehisiya. Gava çavên xwe yên westiyayî vekirin, lê hay bû ko canê wî ji xwêdanê tev şil bûye. Vêya ew bêtir aciz kir. Berî ko ew şiyar bibe, bi çend deqîqeyan mîrata xewê zora Leyla Xanimê biribû û ew li ber serê wî di xew re çûbû.
Robîn li wê niherî. Nehat bîra wî, bê kengî hatibû malê û ketibû nav nivînên xwe. Gava çav li rewşa diya xwe ket, lêva xwe gez kir. Êşiya. Bala xwe da ruyê wê yê ko kul û derdan cih ji tu tiştekî re nehiştibû. Dilê wî bi wê şewitî. Gava dît ko çavên diya wî tev liviyan, dîsa çavên xwe girtin û xwe li xewê danî.
110

Leyla Xanim bi paçikê destê xwe ruyê wî yê xwêdayî paqij kir. Bi dû re, rabû ser xwe û çû ber derî. Westiyabû. Berî ko derkeve, dîsa li xwe zivirî û bi çavên xwe yên ji bêxewiyê nepixîbûn û bi zorê vedibûn, li ruyê lawikê xwe niherî. Bi dû re zivirî, derî bi kerbeke mezin li pey xwe girt û derket. Gava derî hat girtin, Robîn çavên xwe dîsa vekirin. Canê wî giran bûbû. Lihêf ji ser xwe avêt, rabû û rûnişt. Kincên xwe yên şilbûyî ji ser xwe avêtin. Hew bêcemeyê wî lê mabû. Xwe bi wî awayî dîsa li ser nivînên xwe dirêj kir.
Çavên wî vekirî bûn û li bin zikê xênî diniherî. Bîstikekê weha ma û her fikirî. Ji ber ko li malbata xwe dibû bar, ji ber xwe fedî kir. Mîna ko hinekan tif ser çavê wî kiribe, li ber xwe ket, ruyê wî sor bû. Serê xwe be-ra ber xwe da.

Ji xwe re got:
— Ez ji tu gûyî re nabim! Ez ji tu gûyî re nabim...
Divê êdî tiştek bikira. Tiştekî din. Tiştekî nû ko wî ji vê rewşê xelas bike.
Gava li xelasiyê fikirî, Bişar hat bîra wî. Bi hêrs li nameya wî fikirî dîsa. Qet nebe wî ceribandibû! Heke bi ser neketibe jî ew ê ji xwe re bibêje »min ceriband.«
Rêza yekem ya nameya wî di serê xwe de dubare kir.
… Hespekî har di bin min de ye. Ez nikarim wî rawestînim.
Gava derî vebû û Serdar ket hindur, wî hîn ew rêzik di serê xwe de dubare dikir. Serdêr li wî niherî. Hêsir ji çavên Robîn diherikîn û ji kêlêkên çavên wî xwarî erdê dibûn. Ziq li bin zikê xênî diniherî. Li wî hay nebûbû. Ji bo ko wî nexe ber fediyê, Serdêr jî tiştek negot. Berê xwe da aliyê din, pirtûkek ji refikê daxist û beyî ko dîsa li wî binihere, ji odeka wî derket.
Çavên Robîn dîsa hêdîka çûn ser hev. Ji nişka ve ruyê Bişêr hat ber çavê wî û çû. Mîna şewqeke ko ji nişka ve vêkeve û wenda bibe. Çavên xwe bi tirs vekirin û sekinî.
— Ev çi bû, îja?
Çavên xwe dîsa birin ser hevdu. Vê carê, li devereke din bû. Ji bo ko nas bike, li dora xwe niherî. Hindur nîvtarî bû. Li dora wî çend textik mex-tik, lodeyeke pûş î piçûk û çend sergîn û tepikên rêxê yên jihevbelavbûyî hebûn. Bêhneke kevin û sar ji hindur dihat.
Serê xwe rakir û li jorê niherî. Bin zikê xênî mîna camiyekê bû. Konên
111
REŞ Û SPÎ

pîrê li dîwaran çêbûbûn. Hawîrdor gemarî bû. Berê xwe da aliyê din.

Ji nişka ve çav li wêneyekî ket. Wêne mezin bû û pir li jorê hatibû daliqandin. Pîrekeke ciwan a xweşik, bi fîstanekî şîrkî û di himbêza wê de jî lawikekî piçûk î kirasspî yî porzer û çavşîn hebû. Li dora serê lêwik, şewqeke zer çêdibû ko dora xwe ronî dikir. Bi awayekî ecêbmayî li wêneyî niherî. Reşahiyek ber bi çavên wî ket. Li wî aliyî zivirî.
Keçikek. Bejna wê zirav û lihevhatî. Esmer. Porê xwe bera ser milên xwe daye. Çavên wê reş û gir, ruyê wê zirav û lêvên wê xweşik. Li hember wî, di nav bêhna hindur de, mîna semboleke bedewiyê sekinîbû û li wî diniherî.
Robîn ji xweber destê xwe dirêj kir û got:
— Nûşîn...
Nûşînê jî destê xwe dirêj kir, lê wek ko tiştek wê bi paş ve dikişîne, hêdî hêdî bi şûn de çû û di nav wê tariyê de wenda bû. Serê Robîn hêdîka ket ber wî.
Dîsa vegeriya û li erdê niherî. Çavên wî li tiştekî din ketin. Li wî aliyî zivirî. Bişêr li ser lodeya pûş, herdu destên xwe xistibûn nav çongên xwe û xwe xûz kiribû. Raketibû. Kincên wî tev qetiyayî û gemarî bûn. Bala xwe da ruyê wî. Ji rîha wî û gemara ruyê wî xuya bû ko ji zû ve ji vira derneketibû. Ruyê wî zer bûbû. Biniya çavên wî reş bûbû. Lawaz bûbû. Ji sermayê dilerizî.
Robîn veciniqî û rabû ser xwe. Li dora xwe niherî. Pencere, dîwar, pirtûkxane, maseya xebatê ya ko ev çend roj in, wî ne berê xwe dayê û ne
jî rêzek nivîsandiye, kaxiz maxizên li ser wê, li dîwêr wêneyekî pira de-hderî û bircên Diyarbekirê…
Hêdîka rabû ser xwe, rahişt qutikê xwe yê li ser kursiyê û çû ber pencereyê. Li derve niherî. Dinya rohnî bû. Berf sekinîbû. Her dever spî bûbû. Bajar di bin berfê de mabû. Ji şewqa berfa erdê, çavên wî şewitîn.

Çavên xwe rakirin û li avahiyên ko ji dûranê xuya dibûn, niherî. Ezman çik î sayî bû. Bi hemû zelaliya xwe dibiriqand.
Vegeriya û dîsa li ser nivînên xwe rûnişt. Serê xwe xist nava herdu destên xwe û ma. Çavên xwe bera ser teraha li erdê da û çend deqîqeyan bê tevger
sekinî. Bi dû re, keserek kişand û rabû ser xwe. Çû li ber wêneyê li dîwêr sekinî. Ew ji dîwêr daxist û di destê xwe de girt. Bîstikekê lê niherî. Hêrs bû. Çavên wî sor bûn. Tiliyên wî şidiyan. Xwast ko wêneyê di destê xwe de biavêje erdê û bişkîne, di ser de jî bi hemû hêza xwe pihînekê lê bixe û
perçe perçe bike. Belkî bi wî awayî, dilê wî dê hebekî rehet bibûya.
112

Weha nekir. Wêne avêt ser maseyê û dîsa çû ber pencereyê. Bi çavên ko ji kerban bûbûn wek du bizotên êgir li dûranê niherî. Destên xwe kirin kulm û şidandin. Bi dû re, dîsa vegeriya ser nivînên xwe û rûnişt. Canê wî hêdîka sist bû û ma. Hew dizanîbû, bê dê çi bikira. Dîsa serê xwe xist nava herdu destên xwe û bala xwe da perxaneya ko li odeka xwe çêkiribû. Bişar dîsa hat bîra wî. Ew dîmena di hindurê wê dêra kevin de... Zikê wî bi hevalê wî şewitî. Bêriya wî kir. Hew wî bi tenê dikarîbû ew fahm bikira. Niha li kû bû gelo?
Le çi karê Nûşînê hebû di wê dîmenê de? Ma qey dibe ko xewna wî rast be û hin işaretan bi ber wî bixe? Nizanîbû. Bê çare mabû. Vir de diçû, wê de diçû, dîsa dihat û li şûna xwe rûdinişt.
Bişar çûbû, wenda bûbû. Ew dîsa bi tena serê xwe mabû. Hew dixwast çav li Gulcanê jî bikeve. Li neheqiya ko li wê dike, fikirî. Him ji wê hez nedikir, him jî qet nedixwast ko serê xwe ji himbêza wê rake. Ji ber xwe fedî kir. Hema xwast ko bimire û ji vî derdî xelas bibe.

Serê xwe bi kerb hejand. Kela girî dîsa ket qirika wî. Kir û nekir, nikarîbû bigiriya. Hêrsa wî di dilê wî de bûbû gulokek û mezin dibû. Pakêta xwe ji bêrîka qapûtê xwe derixist û çixareyek pêxist. Wê gavê, dît ko tiliyên wî dilerizin. Ne bi tenê tilî, lê her deverên wî dilerizîn. Hew dikarîbû li ser lingan rawestiya. Zû bi zû çixare danî ser xwelîdanka li ser maseyê. Di cihê xwe de rûnişt û xwe bi ser piştê de avêt erdê.
Serê wî gêj dibû. Piştî ko çend deqîqeyan li erdê bi wî awayî ma, berî ko hin werin hindur û wî di wê rewşê de bibînin, rabû ser xwe û dîsa çû, li şûna xwe ya berê rûnişt û ma.
Tiliyên wî hîn jî dilerizîn. Jana ko di mejiyê wî de digeriya û ew di nav xwe de vedigevizand, mîna esrarê di damarê wî de digeriya û ew bêhiş dikir. Sînga wî bi lez radibû û dadiket. Bi dû re, bi vê serxweşiya xwe, dîsa rabû û bi gavin giran çû, hêdîka rahişt wêneyê li ser maseyê. Li dewsa wî ya berê daliqand. Gemara ser wêneyî, bi kefa destê xwe paqij kir û bala xwe dayê.
Her gava ko wî li vî wêneyî diniherî, bêhna wî fireh dibû. Lê, vê carê weha nebû. Mirov digot qey ew sêhra vî wêneyî betal bûbû û çûbû. Vê carê bêhna wî ji berê bêtir teng bûbû. Ew jî li vê yekê hay bûbû. Dîsa li wêne niherî, mîna ko li dijminê xwe binihere çavên xwe qels kirin, di-ranên xwe şidandin, hêrsa xwe li ser hev civand û mîna ko bi însanekî re bixeyide û biqîre, di dilê xwe de got:
— Tu jî hew ji tû gûyî re dibî, weleh!
113
REŞ Û SPÎ

Kir niçe niç û bi wî awayê xwe yê ko tu nemabû ji hêrsa xwe biteqiya, bi kerb serê xwe kil kir. Kesereke kûrtir kişand, axînek ji sînga wî ber bi qirika wî ve hat û derket derve. Kelogirî çû li ber pirtûkxaneya xwe sek-

inî. Serê xwe rakir û bi çavên xwe yên şil û sorbûyî li refika jorê niherî. Ji wira rahişt torbeyekî naylon û hat dîsa li ser nivînên xwe rûnişt. Torbeyê reş û tozgirtî dawişand û vekir. Destekî xwe rada hindurê wî û wêneyek jê derixist. Hêsirên wî hêdî hêdî diherikîn.
Têra xwe lê niherî. Mîna ko mirov li çavên hezkiriya xwe ya kevin binihere û tê de biçe binê newalên kûr, çolên bêdawî, okyanûsên bêbinî… Wêneyekî din derxist û danî ser yê din. Dîsa yê din ji binî derxist û ji berê kûrtir lê niherî. Bîstikekê, carê li yê din û carê li yê ko bi dû re ji torbe derxistibû vegeriya û ma. Bêhna wî li ber çikînê bû. Hêsirên wî mîna ko xwe li ber melodiyeke giran berdin xwarê, herikîn ser hinarikên ruyê wî û ji xwe re rêyin peyda kirin, daketin heta jêra çenga wî û ji wê derê jî niqutîn xwarê. Her ko hêsirekî din diniqutî, bêvila xwe dikişand û kerba dilê xwe dikir axîn û derdixist derve.
Çend wêneyên din jî avêtin ser yên din. Hin ji wan bi niqutên hêsirên wî şil bûbûn û xera bûbûn. Bi êşa serê wî, him giriyê wî û him jî hêrsa dilê wî pirtir dibû. Heta ko ruyê wî û çavên wî nepixîn, giriya. Wêne giş ji torbe derxistin, di destê xwe de dan ser hev, mahdê xwe tirş kir û bi hemû hêza xwe, got ‘peleq’ û ew li bin guhê dîwêr xistin. Wêneyên ko li dîwêr ketin, li wê rastê bela wela bûn.
Xwe bi ser dev de avêt ser nivînên xwe û demeke dirêj bi wî awayî ma.
Çûyin? Mayin? Çûyin? Mayin?… Kerb… Bitenêtî… Keser…
Hesret… Mirin… Giş jî weke hev… Yek ji yekê xerabtir…
Serê xwe ranekir. Giriyê wî sekinî. Westiyabû. Lê, hê jî dilê wî rehet nebûbû. Dikira dîn bibûya. Çûyin û mayin, bûbûn mirin û mirin.
Tiştekî din nedihat bîra wî. Rêyeke din. Dermanekî din. Merhemek ji vê birînê re. Haho!!! Hawar gidiyano!!!
Mayin: Terikandina hertiştî. Jibîrkirin. Her û her di nav bêrikirinê de helandina dil û mejî…

Çûyin: Çûyina kî derê? Ji bo çi? Bi çi mebestê?..
Kîjan? Kîjan?
Kîîîîîîîîjaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaan!
114

Di nav van fikran de, asê mabû. Ev asêbûn jî tirs bera dilê wî dida. Her ko digot 'çûyin,' tirsa wî mezintir dibû. Bi vê tirsê re meraq û heyecana wî jî... Jan…
Hew dikarîbû xwe ji nav van fikran xelas bikira. Tirs, meraq û heyecan, tev li hev dibûn di dilê wî de, diçûn û dihatin. Şerekî mezin dest pê kiribû. Hêdî hêdî ber bi têkçûyinê ve diçû. Sînga wî wek volkanekê dike-liya, dikeliya. Hindik mabû ko bigota 'gurm' û biteqiya.
Tirsê zora heyecan û meraqê bir. Mîna ko li tiştekî ecêbmayî mabe, çavên wî fireh bûbûn. Çi tiştê ko dizanîbû, çi kesên ko nas dikirin, çi ruyên ko di bîra wî de mabûn; çi bira, çi heval, çi yar; çi kolan, çi bajar, çi welat; çi stran, çi helbest, çi çîrok, çi romanên ko dihatin bîra wî hebû-na… Gişan ji wî re eynî tişt digot. Û ji nava wan, yek jî li dijî yên din dernediket. Heta, kabûsên wî jî ji wî re eynî tişt digot:
Vegere. Vegere û were.
Ez werim?
Belê.
Ji bo çi?
Rizgarî.
Çawa?
…
Kî der?
…
5. Tifaq…

Gava Robîn di odeka xwe de, di nav kul û derd û janên xwe de vedigevizî, diya wî Leyla Xanimê jî ji bo wî li serşokê av germ dikir.
Leyla Xanim heta sibehê, li ber serê wî mabû. Xwêdana eniya wî û piş-ta wî paqij kiribû. Ji ber ko ji rewşa kurê xwe, tu tişt fahm nedikir û nikarîbû çareyekê jê re bibîne, bêtir li ber diket. Di ber xwe de digiriya. Ji bo ko kes bi wê û giriyê wê nehise jî ji serşokê dernediket.
Serdar carekê ji bo ko dest û ruyê xwe bişo, ketibû serşokê; lê gava ko çav li diya xwe û giriyê wê ketibû, dibe ko têgihiştibe, beyî ko wê bi xwe bihisîne, serê xwe bera ber xwe dabû û hêdîka bi şûn de vegeriyabû. Ji xwe, gava ji bo pirtûkê ketibû odeka Robîn, ew bi çavên xwe dîtibû û rewşa wî fahm kiribû.

115

REŞ Û SPÎ

Robîn her ko diçû ji wan bi dûr diket. Êdî, hew henek jî bi wî dikirin. Hew bi wî re dipeyivî. Dereng vedigeriya malê. Tew carinan kesî nizanîbû, bê diçe kî derê. Gava dihate malê jî ji odeka xwe dernediket. Herçî Serdar bû, ji ber ko pir ji Robîn hez dikir, niha dilê wî pê dişe-witî. Gava di ser de çav li wê rewşa diya xwe ket, hew dikarîbû debar biki-ra. Hema zû bi zû kincên xwe li xwe kirin, beyî ko dest û ruyê xwe bişo û xwe weke hercar bixemilîne, porê xwe jole bike û li benda taştê bimîne, digel ko hê ji çûyina wî re, gelek wext mabû jî bi dizî derketibû derve û çûbû.
Gava Robîn ji odeka xwe deriket, Leyla Xanimê jî ava wî bera teştê di-da. Çavên wê nepixîbûn, bêvila xwe bi pişta destê xwe paqij dikir. Piştî ko Robîn serî di ber de, di ber wê re derbas bû û ket serşokê, ji bo ko kes tiştekî jê nepirse, hema ket hêwanê û secadeya xwe raxist û dest bi nimêjê

kir. Heta ko Robîn ji serşokê derket û tev li destmala ko pê porê xwe zuha dikir, berê xwe da odeka xwe jî ew ji ser secadeyê ranebû. Dengê lingan ji
medbexê hat û hin di ber deriyê hêwanê re çûn û hatin jî ew qet ji şûna xwe ranebû û berê xwe jî neda wan. Hey selawat kişandin û ji bo ko Xwedê rêyeke baş ber bi kurê wê bixe, dia kirin.
Mehabad rabû çû metbexê. Piştî ko taştê amade kir, ji bo ko Mîtanî şi-yar bike hat li ber deriyê odeka wî sekinî. Dengê Mîtanî ji hindur dihat. Li gora dengan, xuya bû ko dîsa bi Binevşê re dixeyidî. Wê gavê Mehabadê mahdê xwe tirş kir, kire ufe uf, dîsa vegeriya medbexê û li ser sifreyê rûnişt. Meryemê jî berdilka xwe li xwe kiribû û hatibû, li ser sifreyê rûniştibû.
Herdu li benda xelasbûna şerê wan sekinîn. Herçî Mehabad bû, ji bo xelasbûna vî şerê ko êdî hizûrê di mala wan de nahêle, çi ji destê wê biha-ta dikarîbû bikira. Lê ji tirsa Mîtanî, newêrîbû dengê xwe derixistaya. Bîstikekê li ser sifreyê çavên xwe bera niqteyeke ko nayê dîtin dan û sek-inî. Ponijî.
Bêhna wê pir teng bûbû. Îmana wê ji herduyan jî diçû. Ji cerga ko Binevş hatibû nav vê malê, tifaq di nav wan de nehiştibû. Mîtanî jî dikir û nedikir, bi wê nikarîbû. Binevşê tu carî bi ya wî nedikir. Ji ber wê, wan hema hema herroj şer dikir êdî.
Bi qêrîneke Binevşê bi xwe hisiya, dîsa rabû ko biçe ber derî. Resûl Beg jî bi dengê wan rabûbû û bi destan tiştin ji Leyla Xanimê dipirsîn.
Mîtanî hey ji Binevşê re digot:
— Keçê, li min guhdarî bike, keçê! Destê xwe deyne! Destê xwe deyne,
116

ez ji te re dibêjim!

Û diqêriya. Dengê wî û dengê giriyê Binevşê tev li hev dibû û dihat derve. Carekê, dengê sîleyekê jî hat bihîstin. Bi dû re, yeka din û yeka din.
— Serê xwe rake, keçê! Keçê, serê xwe rake!
Binevş digiriya û diqêriya. Dengê Mîtanî bi ser yê wê diket:
— Hiş be! Negirî! Negirî, keçê!
Dengên sîleyan li pey hev dihatin. Leyla Xanim û Resûl Beg û Mehabadê nizanîbû, bê divê wan çi bikira. Şaş mabûn. Mîtanî û Binevşê berê jî gelek caran pev çinîbû, lê tu carî li şerekî wan yê bi vî rengî rast nehatibûn. Ruyê hersiyan jî zer bûbûn, çavên wan fireh bûbûn. Carekê, Resûl Beg xwast ko deriyê wan veke û têkeve nav wan, lê Leyla Xanimê ew zevt kir û nehişt tev bilive. Bi zorê peyv anîbûn ser hev û got:
— Bihêle, hela. Bihêle, bê çi dibe.
Di dilê xwe de jî digot:
— Ox bû. Divê Mîtanî berî niha lêxistineke baş li wê bikira. Vê qahpika hanê, tifaq di mala me de nehişt.
Şêrê wan her ko diçû, gurtir dibû. Piştî dengê çend sîleyên din ko li Binevşê ketin, derî ji nişka ve vebû û Binevş bi bazdan derket, di nav wan re derbas bû û berê xwe da deriyê derve.
Li xwe dixist û digiriya. Çavên wê tu der nedidît. Dikir haho. Ne li ser hişê xwe bû. Diricifî. Mîna dînan hereket dikir. Porê wê tev li hev bûbû. Heke aniha derketaya derve, yê rastî wê bihataya, dê bigotaya qey ev jinik
ji şerekî mezin derketiye, xwe ji nav lepên deh kesan xelas kiriye û hatiye. Hema li dora xwe dizivirî û dima. Nizanîbû bê dê çi bikiraya.
Bi dû wê re jî Mîtanî ji odekê derket. Çavên wî weha bûbûn ko dikira ji serê wî baz bida. Dev li zimanê kiribû. Hêrsa wî ji çavên wî yên sor, xuya dibû. Hê Binevşê nû derî vekiribû, hema xwe çeng kirê û hişk bi destê wê girt.

Binevşê dikir haho û bi destên xwe ruyê xwe ji ber sîleyên wî diparast. Dengê wê li hindurê apartmanê belav bû û olan da. Cîrana hemberî wan, bi dengê wê re deriyê xwe vekir, li wê niherî, lê bi dû re ji tirsa, dîsa deriyê xwe girt û ket mala xwe.
Binevş li erdê rast bûbû. Li her cihê ko derb lê diket, şûna tiliyên Mîtanî çêdibû. Mîtanî him lê dixist, him jî ew di pey xwe re dikişkişand odekê. Di ber re jî digot:
— Tu bi ya min nakî, ne weha! Tu bi ya min nakî. Ez ji te bim, heke dîsa min tu bi xwe re birî cihekî, lê! Tu bi ya min nakî, ne weha! Ez ji te

re dizanim!
Ew di pey xwe re xist odekê û derî dîsa li ser xwe girt. Mîtanî di ber Leyla Xanim, Resûl Beg û Mehabadê re bihurîbû. Tew belkî li wan hay nebûbû. Belkî jî ji wan pê ve, li tu tiştekî din nedifikirî.
Ya rastî, gava biryara xwe dabû ko di pey Binevşê re derkeve, rezîlbûna xwe ya li hember malbata xwe jî hesibandibû. Hêrî zêde jî li ber vê yekê diket. Ji ber wê, gava li wan rast hat û bi hêrs di nav wan re derbas bû, mî-
na ko li wan hay nebûbe tev geriyabû û ji bo ko hetika wan anîbû, piştî dîsa derî li ser xwe girt, têra wê li Binevşê xistibû û kerba xwe ji serê wê derixistibû.
Piştî çend deqîqeyan, deng ji wan biliya. Hew carê dengê Mîtanî dihat, lê ew jî nedihat fahmkirin. Xuya bû ko bêhna wî jî hatibû ber û êdî dev ji lêxistinê berdabû û şîret li jina xwe dikirin. Gava ko peyva wî xelas bû jî got:
— De rabe, biçe serçavê xwe bişo. Ji vê carê û pê ve jî xwe bike însan û

gava ko hinekan tiştek ji te re got, bi ya wan bike. Ne ko tu tiştan bi serê xwe bikî. Ez dîsa destê xwe bi te bikim, welehîn, heta ko ez te nekujim, ez dev ji te bernadim. Bila vêya jî di bîra te de be. De rabe ser xwe. De!
Piştî bîstikekê, Binevşê derî vekir, serî di ber de derket û berê xwe da serşokê. Mîtanî jî di pey wê re derket. Berê, li ber deriyê serşokê sekinî, bi
hêrs li wê niherî, diranên xwe şidandin, serê xwe jê re kil kir û kesereke kûr kişand. Bi dû re jî berê xwe guhert û çû medbexê, cem yên din, li ser sifreyê rûnişt. Ji ber ko li ber gişan li jina xwe xistibû, yên din jî ji wî tir-siyabûn. Hayê wî jî ji vê yekê hebû. Ji lewre, mîna axayekî ko biçe nav xu-lamên xwe ketibû medbexê.
Yên din mîna ko tiştek nebûbe, çay jê re dagirt, qedeha wî danî ber wî û dîsa bala xwe da xwarinê. Berî ko ew bi xwe bixwaze, şekir jî û nan jî danîn ber wî. Qedeha wî ya avê jî hat ber. Wan digot qey hema Mîtanî li wan li hemana ye û dike dora wan jî bê. Him tirsiyabûn ko Mîtanî destê xwe bi wan jî bike, him jî ji bo ko dilê wan li Binevşê rehet kiribû, hurmeta wan ya li hember wî, bêhtir bûbû. Lê dîsa jî dilê wan bi Binevşê şewitîbû.
Ji nav yên malê, bi tenê Resûl Beg cida difikirî. Ji derveyî liberketina wî ya ji bo tunebûna tifaqa malê, ji bo kurê xwe jî li ber diket. Her ko dengê wan bihata wî, bêtir li ber diket û hey ji xwe re digot:
— Ev kurê min, bi vî karî nizane. Hê nikare bi jinekê re derkeve serî, tew ew ê çawa ji vê malê re sermiyantiyê bike. Rojekê serê min bi aliyekî
118

de bikeve, Xwedê neke tiştek bi min were û ez bimirim, ew ê ev mal xera bibe. Xwedê çê bike!
Çend caran wî jî xwastibû ko bi lawê xwe û bûka xwe re bipeyive, lê

belê hem ji ber qirika xwe û hem jî ji ber ko tirsiyabû ko kes bi ya wî neke û ji ber wê dev ji vê fikra xwe berdabû.
Herçî Resûl Beg bû, piştî wê emeliyata ko dengê wî birîbû, êdî hew bi xwe bawer dibû. Ji xwe, yên malê gişan dizanîbû, bê Resûl Beg li ser rewşa Mîtanî û Binevşê çi difikire. Gişan dizanîbû ko ji ber şerê wan pir aciz dibe, lê nahêle ev aciziya wî xuya bibe.
Carinan, ew jî li vê rewşa xwe difikirî û li ber diket. Heke ew qeweta wî ya berê hebûya û dîsa mîna berê bikarîbûya peyva xwe bi yên dora xwe bida guhdarîkirin, wî ê bi du sîleyan Mîtanî jî Binevşê jî bidaya ber xwe û bikiraya ko nema deng jî wan derketaya. Ji lewre, her gava ko ev yek di-hat bîra wî, hema serê xwe bera ber xwe dida, diponijî û kesereke kûr dik-
işand ko bala herkesê dora wî dikişand.
Binevşê nehat ser sifreyê. Mîtanî bi dengekî bangî wê kir, lê deng jê ne-hat. Piştî ko serçavê xwe şuştibû, çûbû û xwe avêtibû ser nivînên xwe. Nedigiriya. Ne di xew de bû jî mîna hercar. Her gava ko ji hinan bix-eyidiya, hema xwe diavêt odeka xwe û radiket. Lê vê carê, mîna ko ji xwe re li rêyekê bigere, çixareyek pêxistibû û diponijî. Çavên wê nepixîbûn û biniya wan reş bûbû. Lêva wê jî xuya bû ko derbeke nebaş xwaribû. Carekê fikirî ko xeberekê bide mala bavê xwe, da ko werin û têkevin nav wan. Lê, ji tirsa ko bavê wê jî li pişta mêrê wê rabe, dev ji vê fikra xwe qeriya. Bi vî awayî navbera wê û mêrê wê jî dikarîbû bêtir xerab bibûya. Li Stenbolê, tu merivê ko di vî warî de peyva wî li ba mala mêrê wê pere dikir jî tune bû.
Divê ji xwe re rêyek bidîtaya. Hew dikarîbû debar bikiraya. Ji ber xwe-siya xwe û gorima xwe newêrîbû devê xwe li malê vekira. Herduyan jî bi çavê dijminan li wê diniherî. Li vê malê, tu kesî ji wê hez nedikir. Newêrîbû biçûya nav wan jî. Di hindur de, her aciz dibû. Ji yên malê di-

tirsiya ko rojekê li wê bicivin û tiştekî bi wê bikin. Mehabadê jî girê xwe ji wê digirt. Her ko dihat malê, tiştekî nû ji xwe û Meryemê re dikirî, lê heta aniha tiştek jî ji wê re nekirîbû. Her şev gava ko diket cem mêrê xwe, ji wî re ev tişt digotin.
Mîtaniyê ko li van peyvan guhdarî dikir, tavilê bawerî bi peyvên wê di-anî. Dibû dijminê xwehên xwe. Diya wî jî li ber çavên wî reş dibû. Ji ber vî girê pîrekan, bêhna wî teng dibû. Êdî, nedixwast ko êvaran were malê.
119
REŞ Û SPÎ

Gava li diya xwe jî guhdarî dikir, ji malê bêtir sar dibû. Li gora diya wî jî ji cerga ko Binevş hatiye, rehetî nedaye wan. Hê destê xwe nedaye tiştekî. Her gava ko Mîtanî ji malê derdikeve, ew jî dikeve odeka xwe û heta êvarî ji wira dernakeve. Bi kesî re napeyive, nayê nav malê, derdê xwe
ji kesî re nabêje. Gava ko li wan dinihere jî eynî mîna ko li dijminê xwe binihere, awirên tûj dide wan. Bi dizî nên dixwe. Ji wan hez nake.
Li gora Leyla Xanimê, armanceke Binevşê bi tenê hebû. Binevşê dixwast Mîtanî ji malê cîhê bike. Ji bo vêya jî nexweşiyê li malê derdixe û tifaqê xera dike. Êvaran jî fesadiyê ji wî re dike û dike ko mal li ber çavên wî reş bibe. Ji lewre, ne ew ji kesî hez dike, ne jî kes hez ji wê dike.
Herçî Mîtanî bû, li kê guhdarî bikiraya, ji wan bawer dikir. Lê dîsa jî ji diya xwe re digot:
— Hûn neheqiyê li jinikê dikin. Heke hûn bixwazin, hûn ê bikarin wê baş bikin, lê hûn naxwazin.
Gava ko diçû cem jina xwe jî ji wê re digot:
— Tu nizanî xwe bidî hezkirin. Tu karê malê nakî. Gava tu dikî jî tu mineta xwe dikî. Ew ji te mezintir in. Diya min û Mehabad çi ji te re

bibêjin, tu ê bi ya wan bikî. Ger tu weha bikî, şer jî nema di nav we de derdikeve.
Li ser taştê, bêdeng rûniştibûn. Kesî newêrîbû dengê xwe jî bikira. Wê gavê, weke ko li tiştekî hay bibe, Leyla Xanimê serê xwe rakir û li dora xwe niherî.
— Ma qey Serdar ne li hindur e?
Meryemê bi hemû safbûna xwe bersiva wê da.
— Derket derve. Çû.
Herçî Leyla Xanim bû, ji vê bersivê ket gumanê. Hebekî fikirî. Bi dû re jî got:
— Ma hê saet çi ye?
Vê carê Meryemê bersiv neda. Li ser sifreyê, bêdengiyeke mezin çêbû. Gişan serên xwe bera ber xwe dan. Ji Meryemê pê ve, kesî hew devê xwe da nên. Mîtanî got qey ji ber şerê wî û jina wî, rewşa malê ji nişka ve hat guhertin. Ew jî hêdî hêdî têdigihişt, bê ka şerên wan dibe sedema çi. Ket ber fediyê. Ruyê wî sor bû. Ji lewre, ew jî qet nepeyivî.
Wê gavê, Leyla Xanim lê hay bû ko malbata wê dike ji hev belav bibe. Heta niha, tu carî tiştekî bi vî awayî neanîbû bîra xwe jî. Lê îroj, êdî ji vê fikra xwe ditirsiya. Ji ber wê, bêhna wê teng bû. Tansiyona wê dîsa rabû. Hêdîka xwe bi dîwêr girt û laşê xwe yê giranbûyî ji erdê rakir û rabû ser
120

piyan. Gava ko rabû ser piyan, serê wê gêj bû, ber çavên wê reş bû. Bîstikekê xwe tev nelivand. Heta ko nehat ser hişê xwe jî weha ma. Bi dû re, bi zorê be jî gavek avêt.
Bi dengekî lerzokî, got:
— Hela ez herim, bê Robîn çawa kir.
Berê xwe da odeka Robîn û derket. Resûl Beg serê xwe rakir û di pey wê

re niherî. Ji meraqeke mezin ko ew bi temamî xistibû bin tesîra xwe û pê ve, tu tişt di çavên wî de xuya nedibû. Pariyê nên di destê wî de mabû. Pariyê ko dicût, di devê wî de zuha bûbû û mabû. Mehabadê di bin ça-van re li Mîtanî diniherî. Serê Mîtanî hê di ber wî de bû.
Leyla Xanim li ber deriyê odeka Robîn sekinî. Bi qiraxa leçeka serê xwe, çavên xwe paqij kirin. Malbata xwe tu carî, di rewşeke weha de nedîtibû. Li mala wê, êdî her û her şer û pevçûn hebû. Kurê wê û bûka wê li hev nedikir. Kesek ji wan jî nikarîbû têketa nav wan. Kurê wê yê din hemû pêywendiyên xwe ji herkesî qut kiribûn, bi nexweşiyeke ko kes pê nizane, ketibû. Yê biçûk jî niha dabû ser şopa wî. Heke rojekê, serê wê jî bi aliyekî biketaya, zarokên wê dê bi tena serê xwe çawa bikarîbûna li hember van kul û derdan tifaqa xwe biparazta û ji hev belav nebûna. Ji xwe, Resûl Beg bûbû nîvînsan, hew dikarîbû bi kêrî van tiştan bihataya. Ji ber wê, hertişt dîsa diket ser milên wê. Divê tiştek bikira ko dîsa tifaqa wan a berê çêbibûya. Divê tiştek bikira...
Piştî taştê, Mîtanî derket. Mehabad jî di pey wî re derket. Meryemê hinek pere ji bavê xwe stend û berê xwe da dibistanê. Ji nav wan, herî hindik ew li ber vê rewşa malê diket. Lê dîsa jî digel zarokbûna xwe, bîra hin tiştan dibir. Ji hersê birayên xwe jî hez dikir û heta niha dilê wê ji wan nemabû. Ji ber ko piçûka malê bû, herkesî ji wê hez dikir û ew li ser destan digirt. Çi bixwastaya, ji wê re dihat kirîn. Yeka wê, nedibû dudu. Delaliya malê bû. Carinan, Serdêr hebekî tahde li wê dikir jî wê dilê xwe ji wî nedigirt. Bi zora Serdêr fêrî xwendin û nivîsandina kurdî jî bûbû. Bi dû re, wê jî ji vî karî hez kiribû. Ji ber ko wan bi kurdî dixwend û dinivîsand jî herî zêde ji Robîn û Serdêr hez dikir.
Herçî Meryemê bû, digel ko heta niha nebûbû dijminê tu kesî, îmana wê jî ji Binevşê diçû. Her gava ko Mîtanî li ber herkesî henekek bi Binevşê dikir û dibû tîqe tîqa Binevşê, eynî mîna ko li dijminê xwe bini-

here, li wê diniherî. Dibe ko ev ji ber tesîra Leyla Xanimê be jî.
Gava Meryem derket, Resûl Beg jî ketibû odeka xwe û dîsa li ber teyba
121
REŞ Û SPÎ

xwe rûniştibû. Her ko Leyla Xanimê ew di vî halî de didît, agir bi kezeba wê diket.
Di malê de, herkes bi derdê xwe biliyabû. Gişan bi derdê hevdû dizanîbû jî kesî ji kesî re nedigot. Roj dibûn meh, meh dibûn sal, sal diqulipîn… Ev bajarê mezin, ev warê nû, çi qasî tişt dabe wan, ji wê zêde-tir jî ji emrên wan dibir. Hew hayê Leyla Xanimê ji vêya hebû.
Ji aliyê aborî ve, tu kêmaniya wan nebû, lê dîsa jî wan li hev nedikir. Şer, pevçûn, çavnebarî, dijminahî ketibû nav wan. Her gava ko Leyla Xanim weha difikirî, ji xwe re digot:
— Tifaq.
Bi dû re jî digot:
— Gava ko tifaq di mala me de hebûya, em nediketin vî halî. Ne ev ba-jar, deh bajarên mîna wî jî bihatana, dê nikarîbûna zora me bibira.
Li gora Leyla Xanimê, sedema nebûna tifaqê jî ji hertiştî bêhtir, hatina Binevşê ya vê malê bû. Ji xwe, ew ji serî de, ji vê zewacê ne razî bû. Ji lewre, her gava ko biraziya wê Gulperiyê dihat bîra wê, ji xwe re digot:
— Aaax… aax. Kesî bi ya min nekir. Heke bi ya min bikiraya, ev bela jî nedihat serê me û em weha ji hevdu bi dûr nediketin. Gulperî keçikeke xwende bû, zane bû, eşîr bû, karê deh pîrekan dikir. Aaax… Bi ya min nekir û ev bela anî serê me…
6. Bes tu bixwazî…
Qey carinan evîn jî li hember hin derdan bêkêr dima...
Robîn kincên xwe li xwe kirin û derket derve. Heta ko ew bi dûr ket û

wenda bû jî Leyla Xanimê ji balqonê, di pey wî re niherî. Lawikê wê mî-
na yekî ko bi jana zirav ketibe, ji ber wê jî êdî têkîliya xwe ji her tiştî qut
kiribe û xwe dabe benda mirinê, dimeşiya. Giran, hêdî, serî di ber de,
mîna ko beyî hişê xwe bimeşe.
Ji vî lawê xwe pir hez dikir. Ji herdu lawên wê, herî zêde, Robîn dişibiya
Seydo. Her gava ko li wî diniherî, Seydo dihat bîra wê. Ew jî mîna wî bi
xwendinê mijûl dibû û bi kurdî dinivîsand. Mîna wî tev digeriya. Ji ber
wê bû ko Leyla Xanimê carinan nikarîbû li ruyê wî bineriya.
Seydo jî derdê xwe ji kesî re nedigot. Carinan, wê ew jî mîna Robîn di
quncikan de zevt dikir ko digiriya. Çi qasî dipirsî jî nikarîbû peyvek ji de-
vê wî derixistaya. Bes ferqeke Seydo hebû; ew ji Robîn bêhtir bi însanan
122

re diket têkîliyê. Xwe mîna Robîn, ji herkesî bi dûr nedixist. Belkî sede-
ma vêya, jiyana li welêt be jî. Ji ber ko Robîn, piştî hatina vî bajarê mezin
weha hatibû guhertin.
Berê ne weha bû. Gava ko di civatekê de rûdinişt, herkesî bi wî re suh-
bet dikir. Lê piştî hatina vî bajarî, êdî hew diçû civatan. Gava ko diçû jî
zêde nedipeyivî û her diponijî. Ji civatan aciz dibû, guh nedida wan;
mirov digot qey li tiştekî temaşe dike ko tu kes pê nizane, an jî li
dinyayeke din dijî. Vê rewşê bala herkesê dora wî dikişand. Lê dîsa jî
awirên wî, kenê wî yê ko niha hatibû jibîrkirin, hurmeta wî ya li hember
kesên dora wî, ew bêhtir dişiband Seydo.
Carinan jî ditirsiya ko qedera Robîn jî bişibe ya Seydo. Ji bo ko weha
nebe, destên xwe li ber Xwedê vedikirin û her dia dikir. Niha, gava ko di
pey wî re li meşa wî diniherî jî ji xwe re digot:
— Ya Rebî! Tu çi qasî mezin î! Tu tiştinan dixuliqînî, qet naşibin hev-
du; tiştinan jî dixuliqînî ko mirov qet nikare wan ji hev derxîne. Hişê

mirov nagihêje karê te. Yek dibe yê din; yê din dibe herdu…
Robîn da nav berfê û çû. Dîsa Xwedê dizane, bê ew ê kengî vegere malê. Her gava ko ew ji malê derdiket, Leyla Xanimê digot qey kurê wê hew vedigere malê. Ji ber ko Seydo jî eynî mîna wî kiribû. Rojekê serê sibehê, ji malê derketibû û hew vegeriyabû malê. Ji lewre, her gava ko Robîn dereng bimaya, heta ko bihata malê, destê wê di dilê wê de bû. Herçî Robîn bû, baş dizanîbû ko diya wî di pey wî re diniherî. Hayê wî ji Resûl Beg jî hebû. Carekê, Resûl Beg heta rawestgeha otobusan dabû pey wî. Robîn li wî hay bûbû. Lê qet nehiştibû ko Resûl Beg bi vêya bi-hise. Ji ber ko dê û bavê wî weha dikir, carinan ew jî ji xwe ditirsiya û her gava ko hin ji serê neqebekê derbiketana, an jî li serê riyekê sekinîbûna, wî digot qey ew ê aniha xwe biavêjin ser wî. Ji ber vê yekê, xwe dida ben-da wan û heta ko ew bi dûr neketana, taya mirinê ew bernedida. Hema bi carekê ve dilê wî dikir gupe gup û tu nedima ko bisekine.
Nizanîbû, bê bi kû de diçû. Dinya sar bû ji xwe, ne roja ko mirov der-keta derve bû; lê belê ew hema aciz bûbû û derketibû derve. Piştî ko hebekî meşiya, berê çû, ket dikanekê. Ji dikandêr destûr xwast û rahişt ahîzeyê ko li Gulcanê bigere. Ji zû ve hevdu nedîtibû û li wê negeriyabû jî. Tew vê yekê, ew bêhtir ji Gulcanê bi dûr xistibû. Digot qey ev salek wan e ko wan hevdu nedîtiye. Ruyê wê bi zorê anî ber çavên xwe, li wê temaşe kir. Wê gavê, fahm kir ko pir bêriya wê kiriye, li ber xwe ket. Nûmareya mala wê zivirand û li dengê zingila wê guhdarî kir. Piştî ko

du caran lê xist, telefon vebû. Dengê Gulcanê yê nerm, tiştin di dilê wî de livandin. Gulcanê çi qasî digot »elo, kerem bikin« jî wî tu bersiv nedayê. Piştî ko Gulcanê jî êdî dev ji peyvê berda û li bêhnstendina kesê hember

guhdarî kir, Robîn ahîze danî û telefon girt. Bîstikekê weha ma. Dikandarê kal bala xwe dabû wî. Heta ko Robîn ahîze danî û hat cem wî û perenin ji bêrîka xwe derixistin jî tev neliviya. Rewşa Robîn fahm kiribû. Gava Robîn pere dirêjî wî kirin, bi destê xwe ew da sekinandin û jê re got:
— Xem nîne, bila bimîne.
Robîn pereyên xwe dîsa xistin bêrîka xwe û beyî ko tiştekî bibêje, serê xwe bi mahneya ko bibêje »bila weha be, spas,« hejand û derket.
Gava derket derve û ba li eniya wî ket, mîna ko hişê wî hebekî hatibe serê wî, sekinî û li dû xwe niherî. Dikandarê kal hê li paş camê rawestiyabû û li wî temaşe dikir. Tu mahne neda perenewergirtina dikandêr. Ji ber ko li vî bajarê mezin, xelkê dikarîbû ji bo çend qurûşan hevdu bikuşta jî. Fikirî, lê ji ber ko nexwast serê xwe zêde biêşîne, dev jê berda. Bi dû re, dîsa zivirî, destê xwe xist bêrîka xwe û meşiya.
Di dilê xwe de, hebekî poşman bûbû ko li Gulcanê geriyabû. Lêva xwe xwar kir, li ber ket. Çima ji wê direviya? Digel ko hê ji wê hêz dikir, çima nikarîbû biçûya cem wê? Wî jî nizanîbû. Qey carinan evîn jî li hember hin derdan bêkêr dima...
Bi xwe re ketibû mihakemeyekê. Lê hay nebû, bê çawa gihîşt rawestgehê.
Otobusek hat û li ber wî sekinî. Deriyê wê yê pêşiyê vebû. Robîn siwar bû. Heta ko biletek avêt qutîkê, şifêr li wî niherî. Bi dû re, dîsa derî girt û otobus ji rawestgehê bi dûr ket. Robîn berê, çavên xwe li hindurê otobusê gerandin, bi dû re jî çû li paldankeke dawiyê rûnişt.
Di otobusê de, ji wî pê ve, zilamekî kal bi tenê hebû. Gava robîn bala xwe dayê, digel ko herkesê li vê taxa piçûk rûdine nas dikir jî lê hay bû ko wî ev zilam tu carî li vira nedîtîbû. Bala xwe zêde nedayê. Dîsa berê xwe da camê û dest bi temaşekirina derve kir. Piştî bîstikekê, mîna ko li tiştekî

din jî hay bibe, veciniqî. Herçî otobus bû, digel ko li her rawestgehê rêwî hebûn jî li tu deveran nedisekinî. Gava ko ji nû ve çavên xwe li dora xwe gerandin, ew zilamê kal rabû ser xwe û ber bi wî ve hat.
Robîn, berê ji vê rewşê tirsiya, lê piştî ko bala xwe da zilêm, tirsa wî piçekî daket. Kincên wî yên spîboz dibiriqand. Di destê wî yê ko bi qasî bala mirov bikişîne xweşik û paqij de, gopalek hebû. Awirên wî yên nerm
124
û ruyê wî yê ko mirov digot qey nûr jê dibariya, hurmeta mirov li hember wî bêtir dikir. Rîha wî ji adetê spîtir û dirêjtir û porê wî yê bi qasî riya wî spî û dirêj jî ji paşiyê de hatibû hûnandin.
Piştî ko Robîn çav li van xusûsiyetan ket, ji berdêla tirsê, hiseke ko ji hezkirin û hurmetê pêkhatî pê re peyda bû. Bi temamî dev ji wê tirsê berda û bi çavên heyirî li hatina wî niherî. Li gora wî, divê ev ne însanekî wek me bûya. Na, ew ne yekî weha bû ko bikare xerabiyê bi însanan bike. Lê belê, ev çi ye? Çima otobus li rawestgehan nasekine? Çima ji wan pê ve, tu kes di vê otobusê de nîne?
Ew zilam hat û li kêleka Robînê ko şaş mabû, sekinî. Çavin wî hebûn ko ji ber xweşikbûna wan, hişê mirov ji serê mirov diçû. Zilêm bala xwe da wî û bi dengekî ko mirov digot qey ji dûranê dihat, hêdîka got:
— Tu dibêjî qey tu nikarî tiştinan biguherînî, ne weha?
Herçî Zilamê Kal bû, mîna ko bi hertiştê wî dizanibû, pirsîbû. Bi pirsa wî û tevgerên wî yên ecêb, çavên Robîn firehtir bûbûn. Piştî ko dîsa bala xwe da kincên wî yên ko berî niha bi hezar salî însanan li xwe dikirin, xweziya xwe daqurtand û peyv di hişê xwe anîn ser hev. Bi tirs pirsî:
— Tu jî kabûs î, ne weha?
Zilamê Kal hêyla xwe da ser gopalê xwe û xwe bi ser wî de xwar kir.
— Ev ne xewn e, Robîn; ne kabûs e jî. Li dora xwe binihere. (Destekî xwe rakir û derve nîşan da, di pencereyê re li derve niherî.) Bala xwe bide

tiştan. Bifikire. Jiyan çi qasî xewn be, ez jî ewqasî xewn im.
Ev çi ye, îcar? Ma însan tu carî peyvên weha ecêb dikin. Robîn jê bawer nekir. Ji xwe, nedişibiya însanan.
Zilamê Kal xwe hebekî din daqûl kir, li hindurê çavên wî niherî û got:
— Li hindurê çavên min binihere û bibêje. Tu ji min bawer nakî, ez dizanim.
Vê carê, Robîn bi tirs bi paş de vekişiya. Mîna ko ji wî bireve, xwe xist quncikê. Tirsiya.
— Netirse, Robîn. Ji min netirse. Belê, ez naşibim însanên ko tu herroj wan dibînî. Kincên min jî ne mîna kincên wan in. Lê ev tişt nabin sedema ko tu ji min bitirsî.
Robîn eynî mîna ko zilêm gotibû li hindurê çavên wî diniherî û guhdarî dikir. Dîsa bala xwe da wî. Fikirî. Herçî Zilamê Kal bû, mirov digot qey dizanîbû, bê Robîn çi difikirî, xwe dabû benda wî ko bigihişta biryarekê. Robîn dîsa mîna berê, xwe bi ser hev de civand, li hindurê çavên wî niherî. Zilamê Kal pişta xwe rast kiribû.
125
REŞ Û SPÎ

— Tu baş fikirî?
Robîn serê xwe kil kir.
Zilêm got:
— Îja, de ka bibêje. Bersivekê bide min.
Û pirsa xwe dubare kir:
— Tu dibêjî qey tu nikarî tiştinan biguherînî, ne weha?
Robîn pêwîst nedît ko tiştekî bibêje. Ji xwe, zilêm dikarîbû fikrên wî bixwendana. Dîsa jî herdu destên xwe mîna ko neçar mabe, vekirin û got:
— Ez nizanim.

Zilamê Kal got:
— De îja, bala xwe bide min.
Robîn têgihişt ko zilam dike ji wî re tiştin ko ew pê nizane, bibêje. Bi meraq xwe da benda wî.
— Tu tişt nîne ko hişê mirov nagihijê. Ma tu dibêjî qey ev tişt giş hatine nivîsandin? Ma gelo mirov nikare li hember hin pêvajoyan derkeve û wan li gora xwe biguherîne?
Robîn hebekî fikirî. Zilamê Kal giş li ser hevdû pirsîbûn. Pirsên wî jî eynî mîna wî ecêb bûn. Bi dû re, got:
— Insan nikare qedera xwe biguherîne.
— Belê, rast e. Lê heke weha be, heke qedera herkesî ji berê de hatibe nivîsandin, însan çima dijîn? Çima ji bo ko ew vê dinyê fahm bikin, mîna te hey serê xwe diêşînin?
Robîn tu bersiv nedayê. Zilamê Kal dîsa peyva xwe dewam kir:
— Em bibêjin, her însan sînorekî wî yê jiyanê heye. Di jiyanê de diçe û tê, li cihekî disekine, ne weha?
Robîn serê xwe bi mahneya erê, hejand.
— Xwedê Teala, hertiştî dide mirov. Tiştekî wî ji yê yekî din kêm nagire. Dinya tije na’met e. Hinek însan ji bo ko xwe bigihijîne wan na’metan û wan bi dest bixe, dikare hertiştî bikin. Hinek jî ji ber nebûna van na’metên dinyayê ko Xwedê ew ji bo me şandine, her diponijin û serê xwe diêşînin, tiştekî nakin. Hinek jî hema çi bi dest bixe, şikiriya xwe bi Xwedê tîne.
Robîn di vira de hebekî aciz bû. Xwe negirt û got:
— Ez van tiştan gişan berê dizanim. Ez bawer nakim ko tu ji bo van gotinan hatibî vira.
Zilamê Kal bişirî.
— Eferim, ji te re. Te li ser zanebûn û gihiştina xwe ez qane kirim. Bes

tu tiştekî ji bîr dikî. Binihere; min ji te re behsa sê celeb însan kir, lê te nepirsî bê çima însan giş mîna hev tev nagerin.
Bala xwe da Robîn, bê piştî vê gotina wî, çi dike û difikire.
Bi dû re, dîsa dewam kir:
— Insan giş mîna hev in. Vêya tu carî ji bîr neke. Giş mîna hevdu ha-tine afirandin, lê jiyan hin xususiyetên wan ji wan distîne û dibe.
— Yê me, tişt bi me nehiştiye!
— Tu xelet î. Jiyanê tiştekî we ji we nestendiye. Lê, we jî tiştek bi dest nexistiye. Welatê we ber bi bayekî ket, hayê wê kesî jê çênebû. Hûn herkê bi deverekê de belav bûn, ketin nav jiyanin biyanî, hatin guhertin. Bi dû re hûn li xwe vegeriyan û hatin ser hişê xwe. Lê wê gavê, ji wê bedewiya welatê we tiştek nemabû. Wê gavê we çi kir?
Robîn vê carê, serê xwe bera ber xwe da.
— Ev yek divê nebûya sedema ko hûn dev ji jiyanê berdin. Di welatekî mîna yê we de, kesên mîna te pir in. Ma tu dibêjî qey tu bi tenê weha yî?
Robîn dîsa tiştek negot. Serê wî hê di ber wî de bû.
— Li xwe bifikire. Te qet carekê jî negotiye ko ez ê berê jiyana xwe biguherînim. Ji ber ko te tiştekî xwe baş zevt nekiriye jî her bayê ko hatiye, tiştek ji te biriye û çûye. Lê, gelo te qet carekê jî gotiye, ez ê tiştên xwe ji nû ve bidim ser hevdu û bimeşim?
Kela giriyê ket qirika Robîn. Mirov digot qey zilam di hindurê wî de bû. Bi hertiştên wî dizanîbû. Lê ya ecêb ew bû ko zilêm hesab ji wî dipirsî. Serê xwe hêdîka rakir, li çavên wî yên gir ên mîna okyanûsan niherî û got:
— Tu kî yî?
Zilamê Kal dîsa bala xwe da ruyê Robîn. Bîstikekê sekinî, bi dû re got:

— Tu çi navî li min bikî, ez ew im.
Herçî Robîn bû, ji xwe têgihiştibû ko esrarengiziyeke vî zilamî heye. Bi vê bersiva wî ya ko dişibiya peyvên kesên ko di romanan de dibin leheng, êdî baş bawer kir ko ev zilam ne rastî ye. Dîsa di xewnekê de ye. Lê heta niha, tu xewnên wî an jî kabûsên wî belasebeb nehatibûn pêşiya wî. Di pey her yekê re, bivê nevê tiştek derdiket. Divê sedemeke vî zilamê kal jî hebûya. Lê… çi?
— Tu çima serê xwe bi min re diêşînî?
Zilêm herdu destên xwe li ser gopalê xwe dane ser hev û çendekî li wan niherî. Bi dû re, dîsa serê xwe rakir, hilma xwe stend û bi wî dengê xwe yê
ko mirov digot qey ji bêdengiyeke mezin tê û ji lewre hişê mirov ji serê

mirov dibir, got:
— Gava kesên mîna te di nav hin tiştan de vegevizîn û asê bûn, yekî mîna min tê û riyekê bi ber wan dixe. Min gelek rê bi ber te xistin, lê te neda ser wan. Ka bifikire. Ew tiştên ko te digot »ecêb e, çawa ev tişt li gora dilê min çêbûn,« û te digot qey şens bû, giş min pêk dianîn. Bi dû re, hemû tiştên ko min ji te re şandin, te pişta xwe da wan. Êdî, ez jî mecbûr mam ko bi xwe werim û rê bi ber te bixim.
Robîn bêhtir ecêbmayî mabû. Çawa yekî ko heta niha ew nedîtîbe, tê û rê bi ber wî dixe. Hebekî hêrs bû. Bi dû re, kenê wî bi vê xewnê hat. Serê xwe kil kir û di ber xwe de keniya. Mîna ko henekên xwe bi zilêm bike, got:
— Ka te tu rê bi ber min nexistin.
Zilêm dizanîbû ko Robîn henekên xwe bi wî dike, lê mîna ko hayê wî

jê tune bû, tev digeriya.
— Ji xwe, ez li benda vê bersivê bûm.
Bi dû re jî lê zêde kir:
— Bila tu vêya baş bizanibî, ez nikarim riyan bi ber te bixim. Ji ber ko tu bi xwe dikarî riya xwe hilbijêrî. Ez vêya baş dizanim. Heke tu bixwazî, tu bi xwe dikarî di jiyana xwe de hin tiştên ko te berê digot; »ez qet nikarim vana biguherînim,« ji kokê de biguherî. Bes tu bixwazî! Wê gavê, tu ê di her tiştî de, bi ser bikevî.
Gava ko Zilamê Kal ev tişt digotin, Robîn berê xwe dabû camê û li derve niherî. Bala xwe baş da derve, lê hay bû ko hê li wî cihî bû ko li otobusê siwar bûbû. Veciniqî û bi lez li Zilamê Kal zivirî. Lê, di otobusê de, ji wî pê ve kes tune bû.
Wê gavê, otobus sekinî. Deriyê wê yê dawiyê vebû. Robîn bala xwe da şifêr. Şifêrê otobusê jî tune bû. Heke weha be, ev otobus çawa hatibû heta
vê derê? Ma qey derî bi xweber vebûbû?
Fikirî. Heke xewna wî xelas bûbe, çima hê di vê otobusa ecêb de bû? Zilamê Kal bi kû de çûbû? Ma gelo bi rastî jî ew tiştên ko wî digot; »tesaduf e«, bi xêra vî zilamî dihatin pê? Ne xwe, hemû tiştên wî di destê vî zilamî de bûn. Ji ber ko jiyan bi xwe tesaduf bû. Ma qet dibe ko jiyana wî di destê vî zilamî de be?
Rabû, weke ko nû ji xewê şiyar bûbe, li dora xwe niherî û ji otobusê daket. Piştî ko ew daket, deriyê otobusê dîsa hat girtin. Gava ko Robîn ji nû ve bala xwe da hundurê otobusê, dît ko Zilamê Kal li paş camê ye, li wî dinihere û dibişire. Xwast ko dîsa biçe û têkeve hindurê otobusê. Çer
128

ko gava xwe avêt, Zilamê Kal bişirî û bi destê xwe işaretî wî kir, da ko di

cihê xwe de raweste. Wê gavê, Robîn rawestiya û mîna ko li ber bigere, li wî niherî. Zilamê Kal destê xwe ji wî re kil kir. Mijekê hêdî hêdî xwe bera ser riyê da. Otobus wenda bû û çû…
Robîn ji sermayê ricifî û veciniqî. Dinya sar bû. Lingên wî cemidîbûn. Serê tiliyên wî ji niha ve qeşa girtibû. Hema, xwe da kêleka riyê û li benda mekîneyekê sekinî. Otobusek ji wê de xuya bû. Robîn heta ko otobus gihîşt cem wî, nivîsa li ser wê xwend û xwe da bendê. Otobus hat û li ber wî sekinî. Robîn siwar bû û çû li dawiyê rûnişt.
Dîsa serê xwe spart camê û li derve temaşe kir. Gava ko otobus di ber rawestgeha nezîkî mala Gulcanê re derbas bû, Robîn çavên xwe li kuçan gerandin. Û gava ko otobus bi dûr ket jî serê wî hêdîka ket ber wî. Çavên wî şil bûn.
Heta ko ji otobusê daket, ruyê Gulcanê ji ber çavên wî neçû. Di nav re jî niherîna Nûşînê ya dawiyê, carê dihat ber çavên wî. Zilamê kal jî hey dihat û di guhên wî de, bi wî dengê xwe yê ko hişê mirov ji serê mirov dibe, digot:
— Çavên xwe veke, bala xwe bide dora xwe. Heke tu bixwazî, tu ê bi ser bikevî.
Otobus dimeşiya. Ruyê Gulcanê bi dûr diket. Gulcanê di pey otobusê re digiriya.
Nûşînê dimeşiya, bi dû re li xwe dizivirî û destê xwe dirêjî wî dikir. Dibişirî.
Wêneyê Diyarbekirê li ber çavên wî dinepixî û mezin dibû… Bircên xerabe bangî wî dikir.
Seydo ji wira li wî diniherî…
Hevalên wî yên din. Hemdîn. Şêxo. Selman. Elî.
Hesret…
Kîn…

Hêrs…
Zilamê Kal hey xwe bi ser wî de daqûl kiribû û di guhê wî de dixwend:
— Binihere, Robîn... Binihere... Hingî tu ê bi ser bikevî.
Otobus dimeşiya. Robîn hêdîka serê xwe rakir. Pişta xwe baş spart paldankê. Çavên xwe girtin û ma. Bêhna wî hatibû ber. Heyecanek ketibû dilê wî. Agirek hêdî hêdî mezin dibû û di hindurê wî de belav dibû…
129
REŞ Û SPÎ

130

Beş III, û şeytan vegeriya...
1. Bajarê bêşeytan
Got, her bajarek şeytanekî wî heye; lê bi tenê, yê vî bajarî tune ye. Wî ev peyv di zarokatiya xwe de, ji parsekekî kal bihîstibû. Li gora efsaneyê, rojekê şeytanek li serê vî bajarî jî dibe bela û ji nişka ve di nava du malbatên mezin de, bi tevlêbûna gelê bajêr jî şerekî mezin dest pê dike. Vî bajarê ko
li der û dora wî gelek ewliya jiyabûn û heta wê rojê bi wê xusûsiyeta xwe ve wek bajarekî pîroz hatibû naskirin, piştî ko Şeytên li wira dest bi lîstikên xwe kiribû, bûbû bajarê şer û talanê.
Kesên ko xwe li dora du malbatan girtibû, hevdu li kû bidîtaya efû nedikir; êrîşî malên hevdu dikir û talan dikirin. Gelê bajêr ji ber vê rewşê bêzar bûbû. Kesî nizanîbû bê ji bo çi şer jî dikir. Heta ko dilê ewliyayekî mezin bi gelê bajêr dişewite û radibe bi Şeytên re şer dike, ev rewş her we-
ha dewam dike. Li gelek deveran dihat gotin, ko ew ewliyayê mezin

hesinkerek bû. Ji ber vê yekê, di encama şerekî mezin de zora Şeytên dibe;
wî dixe hundirê hesinekî, li ser deriyekî kelehê bi zincîran ve girê dide û bajêr ji wî şerê ko kesî nizanîbû bê sebeba wî çi bû, xelas dike.
Wî hesinê ko li ser deriyê keleha hundir hatiye zincîrkirin, rojekê tê dizîn û nema tê dîtin. Li şûna hesinê ko heta roja ko hate dizîn jî her kesê di deriyê kelehê re derbas dibû tû dikirê û digot »lahnet li çavên Şeytên bê,« niha bi tenê zincîrên wî mabûn.
Dihat gotin ko kesê ew hesin dizîbû, dixwast bi xêra wî hesinî bibe xwediyê hêzên şeytanî û herkesî têxe bin emrê xwe. Lê, ji dêleva ko Şeytan têkeve bin emrê wî, ew bûbû hêsîrê Şeytên. Rojekê dîn dibe û hesin li ser dilê xwe cit dike. Piştî ko hesin bi xwîna zilêm dihele, Şeytan jî xwe ji hundirê wî xelas dike û ji ber tirsa xwe ya ji zincîrên li ser deriyê keleha Diyarbekirê, nema vedigere bajêr. Lê dîsa dihat gotin ko gava Şeytên li derveyî bajêr li dû xwe niheriye, ji hêrsan agir bi çavên wî ketiye û hema li wê derê, li ber wê kelehê, li ser heyfa xwe sûnd xwariye û gotiye:
131
REŞ Û SPÎ

— Ez ê rojekê dîsa vegerim...
Li gora ko Robîn bihîstibû, zilamê ko Keleha Diyarbekirê ava kiribû, ew zilam bû ko bi birayê xwe re ava jiyanê vexwaribû û bi vî awayî gi-haştibû mertebeya nemirtiyê. Kilsa kelehê jî bi spîka hêkan li hev xistibû. Herçar deriyên wê ji dêreke Dêrsimê anîbûn û lê xistibûn. Li gora ef-saneyê, ev zilam hê sax bû, carê radibû û dipirsî; bê hela Keleha Diyarbekirê hilweşiyaye, an na. Ji ber ko hilweşîna vê kelehê, wek alameta roja qiyametê dihat qebûlkirin. Herçî mîmarê kelehê ye, piştî ko

dipirse û bersiva xwe distîne, dîsa diçe û radikeve.
Li gora Robîn, di bin her kevirekî vî bajarî de, efsaneyeke jibîrbûyî hebû. Tev li wan hemû efsaneyan jî zarokatiya wî ko êdî bi zorê dihat bîra wî. Di her kuçeyekê de, ruyê hezkiriyeke wî hebû. Li kîjan aliyî bini-heriya, berê xwe bida kîjan aliyî, wî ê di wira de, bîranîneke xwe bidîtaya. Hemû kuçe û kolanên vî bajarî, mîna ko wî ew çêkiribin, yek bi yek nas dikir. Tu qula ko neketibûyê, nehiştibû. Ew û havalên xwe, Şêxo, Selman, Hemdîn û Elî, çi gava ko aciz dibûn hema diçûn ser bircan û carinan, ji ber ko pir digeriyan serê wan diket belayê jî.
Rojekê, bi dizî ketibûn xaneke mezin û dîrokî ko di destê belediyeyê de bû û deriyê wê her girtî bû. Bêhna wê ya ko bi sedan salan nehatibû guhertin û bêdengiya wê ya ko xof bera dilê mirov dida, ew kişandibûn hundirê xwe. Gava li xwe hay bûbûn, riya xwe wenda kiribûn. Wan jî êdî nizanîbû bê çawa riya xwe wenda kiribû. Xwe ji tirsa, hişk bi hevdu girt-ibû û di kuçeyên tarî re derbas bûbûn. Gava ko ji xwe re li rêyekê di-geriyan ko derkevin derve, bi xêra pisîkekê, lê hay bûbûn ko di binê vê xanê de, derbendên veşartî hene. Piştî ko dîsa bi xêra wê pisîkê riya xwe dîtibû û derketibûn, ji zilamekî nodsalî hîn bûbûn ko ji bilî wan derben-dan hê gelek derbendên din jî hene.
Zilêm ji wan re gotibû ko di binê vî bajarî de, duwanzdeh heb derbend hene; belkî hinên din jî hebin, lê hayê kesî ji wan nîne. Ew jî ji kalikê xwe hîn bûbû û niha jî ji wan re digot. Wî zilamê kal ko dê piştî wê bi salekê bimiraya, ji wan re gotibû ko heke mirov bizanibe bê serê derbendê li kî derê ye û heta kî derê diçe, mirov dikare bi xêra wan gelek tiştan bike. Lê çi fêyde, ko tu kesî bi vêya nizanîbû. Gelek kesên ko li pey vê pirsê, xwe bera nav derbendan dabû jî hew vegeriyabûn. Kes newêrîbû bi dû wan de
biçûya û meytên wan jî bianîna. Lê însanan ev derbend her meraq kirin

û di nav xwe de, li ser van derbendan gelek tişt jî gotin.
Ev hemû tişt niha mîna xeyalekê dihatin ber çavên wî. Piştî ewqas
132

salan, ewqas derdan, ewqas kerban, dîsa vegere! Li her tiştî.
Vegera welatê bav û kalan.
Warê dengbêjan…
2. Ev lawik kî ye...?
»û keder li pişta hespê mirov siwar dibe û tê...«, Horatius
Li balafirgehê ruyekî nas jî tune bû. Gava ko ket hundirê hêwana mezin, bi heyecana dîtina hin kesên nas, dilê wî dikir gupe gup. Çavên xwe bê serî digerandin. Lê dû re, hat bîra wî ko xeber nedabû tu kesî, sekinî. Xwe da aliyekî û bala xwe bîstikekê da kesên ko hevdu himbêz dikir.
Gelo çend kes ji van mirovên ko bi wî re hatibûn, bi qasî wî ji vî bajarî bi dûr mabûn? Çend kesan bi qasî wî bêriya vî bajarî kiribû?
Di nav ewqas însanên nenas de, li ruyekî nas geriya. Dijmin be jî! Bes ruyekî nas ko Robînê piçûk bîne bîra wî, Robînê xort.
Kesên ko dihatin bîra wî, heval, meriv, yar, giş hatin û yek bi yek ew himbêz kir û dîsa wenda bûn. Robîn li dora xwe niherî, wêne li ber çavên wî sarbûn û man. Xemgîn bû û serê xwe bera ber xwe da.
Wî digot qey herkes li wî dinere. Mîna ko qebeheteke mezin kiribe, berê xwe bi awayekî dilşikestî guhert û meşiya. Di pey wî re, kî têketaya hêwanê, hema hinek radibûn û bi kêf dihatin pêşiyê. Her ko yek diket hêwanê, pîrekên ko dişibiyan diya wî, keçikên ko dişibiyan Nûşînê, bi heyecan radibûn ser lingan û ber bi wî ve direviyan.
Yê wî, kesekî ko bihataya pêşiya wî û ew himbêz bikiraya, tune bû…
Li derve, li ber teqsiyekê sekinî. Serê xwe ranekir û li dora xwe neniherî. Ezmanê şîn nedît.

Zilamekî simbêlboq baz da û hat li ber wî sekinî. Bi tirkiyeke xerabe pirsî.
— Kerem bike, keko!
Robîn derî vekir û li dawiyê rûnişt. Şifêrê teqsiyê berî ko biajo, li dû xwe zivirî û bala xwe da wî. Weke ko li xortaniya xwe binere, çavên xwe bi melûlî li ruyê wî gerandin. Li rewşa wî hay bûbû, bes tu mahne nedidayê. Tiştek ji wî nepirsî. Berê xwe dîsa zivirand û mekîne şixuland.
Serê Robîn di ber de bû. Heta ko mekîne ji balafirgehê bi dûr ket jî serê xwe ranekir. Dû re, Robîn di ber xwe de tiştin gotin, lê şifêr jê fahm nekir. Şifêrê simbêlboq, di mirêka pêşiya xwe re li wî niherî. Robîn gotina xwe
133
REŞ Û SPÎ

hêdîka careke din jî dubare kir. Çavên şifêr ji nişka ve fireh bûn.
Carekê jî serê xwe ranekir. Mekîne di nav çend taxên din re jî derbas bû û ji ser riyekê dageriya nava bajêr. Her ko diçû dengê der û dorê zêdetir dihat. Piştî demekê, bêhna fêkiyan hatê. Bêhna mastê tirş. Dengê zarok marokan… Kesên ko tiştin bi hev re bazar dikirin. Deng giş tev li hev dibûn.
Şifêr carê di mirêkê re bi çavên bimeraq li wî diniherî.
Serê Robîn hê di ber wî de bû.
Piştî bîstikekê, êdî ew dengên ko tev li hev dibûn li dûranê mabûn. Wê gavê, Robîn carekê bi tenê serê xwe rakir û li dora xwe niherî. Mîna ko tiştin hatibin bîra wî, bi çavên bikerb li derve niherî. Ruyê wî tevizî, kel-ogirî bû û serê wî dîsa ket ber wî. Vê yekê bala şifêr jî kişandibû.
Mekîne hat û li ber goristaneke mezin sekinî. Şifêr dîsa di mirêka xwe re li wî niherî. Lê, ji wî re tu tişt negot. Dû re, li xwe zivirî û dîsa bi tirkiya xwe ya xerabe, hêdika pirsî:

— Ez li benda te bimînim keko?
Robîn bi pişta destê xwe, çavên xwe paqij kirin. Dû re, rahişt berçavka xwe ya ko danîbû kêleka xwe û bi tevgereke giran derî vekir. Daket. Berê, li ezmên niherî. Keserek kişand û meşiya.
Ewrên reş hêdî hêdî ezman dinixumand. Şînahiya ezmên a bîstika din, cihê xwe ji ewrên mahdtirş re hiştibû. Ewr giş li hevdu diciviyan û ji bo dinyayê ji xafil de bigirin, plan çêdikirin.
Hêdîka ber bi goristanê ve meşiya. Sê-çar zarokên ko ji cerga mekîne sekinibû xwe dabû bende, rabûn û da pey wî. Serê Robîn di ber de, di ber çend goran re derbas bû. Beyî ko hayê wî jê hebe, navên li ser wan yek bi yek dixwend û dimeşiya. Ji nişka ve, çav li navê li ser gorekê ket û sekinî. Mîna ko kêrek li pişta wî bikeve, dilê wî êşiya û çavên xwe girtin. Hêdîka vegeriya û hat ber. Navê ko bi boyaxa sor li ser kevirekî hatibû nivîsandin, dîsa xwend.
Hew mabû ko ji hêrsan bêhna wî biçikiya. Ziq li axa ser gorê diniherî. Mîna ko tiştekî di wê axê de bibîne... Lêvên wî ji ber xwe ve liviyan, ri-cifîn. Bi dû re çavên xwe hêdîka girtin û vekirin. Du niqut hêsir, hêdîka di ser hinarikên wî re herikîn. Bêvila xwe kişand, bi zorê rabû ser xwe û meşiya.
Şifêr jî ji mekînê daketibû, pişta xwe spartibû pêşiya wê û çixareya xwe dikişand. Bala wî li Robîn bû. Carê jî çavên xwe bera jêrê didan û bi tiliyên xwe yên dirêj, bi simbêlê xwe yê reş dilîst.
134

Gava Robîn gihişt ser gora Seydo, hêsirên wî xurttir bariyan. Zarokên ko bi hêviya şekir, an jî pereyan bi dorê ketibûn jî piştî ko çav li vê rewşa wî ketin, vegeriyan û çûn li ber deriyê goristanê, li hember şifêr rûniştin. Carê li wî û carê jî li Robînê ko li ber serê gorê rûniştibû diniherî.

Şifêr destê xwe xist bêrîka xwe û bangî wan kir. Zarok bi lez rabûn, hatin û pereyên ko şifêr di destê xwe de dirêjî wan kiribûn girtin û bi kêf ji wira bi dûr ketin.
Herçî şifêr bû, mîna ko ew wan kesên di wan goran de radizên nas dike, yek bi yek çavên xwe li ser wan digerandin û keser dikişand. Dû re, çixareya xwe avêt û bi lingê xwe eciqand û vemirand. Dîsa li Robîn ni-herî. Çû di mekîneya xwe de rûnişt, derî girt û kaseteke kurmancî danî ser.
Ewrên reş, weke ko mirov perdeyê bikişîne ber pencereyê, xwe li ezmên digirt. Digel ko hê roj neçûbû ava jî di ezmên de piça ronahiyê nemabû. Ji nişka ve, şirqîniyeke mezin hat bihîstin û çirûskek li ezmên pêket û dîsa wenda bû. Eyn mîna ko têleke elektrîkê ketibe xwarê, agir jê çû. Piştî çend deqîqeyan, êdî şirqînî û gurmîniya ko ji ezmên dihat bêhtir bûbû û ronahiya ko bi carekê şewqa xwe dida der û bi şûn de vedikişiya bêhtir di-
hat dîtin. Asoxî, ewran bi a xwe kir û ji nişka ve, bi xezebekê, berê berhe-ma xwe da dinyayê.
Baranê berê bi çipik çipik dest pê kir û dû re, mîna ko dixwaze cama teqsiyê qul bike, xurt bariya. Şifêrê ko di xew re çûbû, hema çer ko li xwe hay bû û çavên xwe vekirin, bi lez derî vekir, daket û li aliyê Robîn niherî. Robîn hê jî mîna berê li goristanê bû û xwe bi ser gorê de avêtibû. Heta ko şifêr li wî hay bûbû û xwe di bin wê baranê de bi zorê gihandibû ba wî, canê wî tev şil bûbû.
Şifêr serê wî rakir û ruyê wî yê ko tev bûbû herî, bi destê xwe paqij kir. Berçavka wî derixist û xist bêrîka çakêtê xwe.
Tu deng ji Robîn nedihat. Ne li ser hişê xwe bû. Çavên wî werimîbûn. Di her destekî wî yê ko hişk jidandibû de, kulmek ax hebû.
Mêrik kir û nekir, Robîn nehat ser hişê xwe. Hema ew rakir û xist him-

bêza xwe. Hew mabû ko ber bi teqsiyê ve bireve, weke ko tiştek hatibe bîra wî, sekinî. Li lawikê himbêza xwe niherî.
Ruyê wî yê bi baranê hatibû şuştin, spîboz bû û dibiriqand. Porê wî tev şil bûbû. Berçavka wî ya bêçarçove anî bîra xwe. Li kincên wî yên nû û xweşik niherî.
Ev lawik kî bû? Qet nedişibiya Diyarbekiriyan.
135
REŞ Û SPÎ

Baran bi hêztir dibariya. Herdu jî şil û pil bûbûn. Erda goristanê giş bûbû herî. Bi lez vegeriya cem wê gora ko Robîn li ser digiriya. Hey pirsek di serê xwe de dubare dikir û bi heyecaneke mezin li bersiva wê di-fikirî.
Ev lawik kî bû?
Ji bilî vê pirsê, tu tiştekî din nedihat bîrê. Dilê wî bi lêwik şewitî.
Gava ko xwe daqûl kir û navê li ser mermera gorê xwend, bi carekê ve veciniqî. Dîsa xwend. Dîsa xwend. Dîsa vegeriya ser lêwik.
Çi têkîliya vî lawikê himbêza wî û vê gorê hebû? Ma ev lawik kî bû? Çi karê wî li ser vê gorê hebû?
Hemû pirsên bi vî rengî, dibûn gulok û di serê wî de diçûn û dihatin.
Piştî ko kulîlkeke sor jî li ser axê dît, êdî bi temamî meraq kiribû. Ev es-rarengîziya vî lawikî, bi meraqeke mezin re, şewatek xist dilê wî ko wî jî nizanîbû bê sebeba wê çi bû. Hema di nav wê heriyê de, bi lez xwe gihand cem teqsiya xwe û deriyê dawiyê vekir. Robîn li ser paldankê dirêj kir û derî dîsa girt.
Ev lawik kî bû?
Deriyê pêşiyê bi lez vekir û ket hundir. Heta ko bêhna wî hebekî hat ber, sekinî. Canê wî şil bûbû. Dilopên baranê, ji nav porê wî diherikîn ser

ruyê wî û ji wira jî xwe bera nav canê wî didan. Bi lez çakêtê xwe ji xwe kir û destmalek ji ber paldanka xwe derixist, ruyê xwe û porê xwe zuha kirin. Rahişt rojnameya kêleka xwe û li ser paldanka din raxist. Qondera xwe ya bi herî ji lingê xwe kir û danî ser. Di ber re jî nivîseke mezin ya li ser rojnameyê xwend:
»Di şerê ko şeva çû li Colemergê çêbû de, çar mirî, deh birîndar hene. Şer hê jî dom dike.«
Şifêr diranên xwe hişk şidandin û serê xwe bi kerb hejand. Bi dû re kesereke kûr kişand ko axîneke jidil ji sînga wî ber bi jorê ve derket derve. Bi hêrs pê li debriyajê kir û destê xwe li fitêzê xist. Mekine bi rê ket. Ji nav heriyê derket ser riya asfalt.
Baran hê jî dibariya. Şifêr êdî bi dijwarî ber xwe didît. Paspasên cama teqsiyê, bi lez diçûn û dihatin. Mêrikê ko ji ber nûçeya rojnameyê hêrs bûbû û di ber re jî ev lawikê biyanî ko di mekîneya wî de bêhiş veketibû meraq dikir, carê di mirêkê re li Robînê ko li ser paldanka dawiyê dirêjkirî bû, diniherî.
136

Ev lawik kî ye?
Robîn beyî ko deng jê derkeve veketibû. Çongên wî heta nava wî kişiyabûn. Mijangên wî hê şil bûn. Tev nediliviya.
Piştî bîstikekê, mêrik leza mekîneya xwe kêm kir û xwe hêdîka da kêleka riyê. Dîsa di mirêkê re li wî niherî. Serê xwe bera ber xwe da û ponijî. Nizanîbû bê dê çawa bikiraya. Gelo lawik bibiraya kû? Berê, fikirî ko li benda lêwik bimîne ko were ser hişê xwe; lê bi dû re, dev ji vê fikira xwe berda.
Piştî demeke dirêj, dîsa keserek kişand û serê xwe rakir. Li dû xwe zivirî û li ruyê lêwik niherî. Robîn hê jî beyî hişê xwe û beyî ko tev bilive, di xew

de bû.
Ev lawik kî ye? Ji kû tê û diçe kû? Çi karê wî li vira heye? Çi têkîliya wî bi Seydo re heye?
Herçî şifêr bû, Seydo baş nas dikir. Seydo heyşt sal berê hatibû kuştin û şehîdekî bi nav û deng bû. Li Diyarbekirê herkesî navê wî dizanîbû. Gava ko hatibû kuştin, ji bo wî, hefteyekê dikan giş hatibûn girtin. Meşeke mezin çêbûbû. Yên ko ew nas nedikir jî wêneyê wî mezin kiribû û li malên xwe daliqandibû. Li ser wî gelek stran û çîrok hatibûn gotin. Xelkê navê wî li zarokên xwe kiribû.
Lê belê, ev lawik kî ye? Qet dirûbê wî jî nade. Çi têkîliya wî bi Seydo re heye?
Dîsa bi hêrs diranên xwe şidandin û pê li xazê kir. Beyî ko bizanibe bê bi kû de dihere, berê mekîneya xwe da nav bajêr. Piştî ko du caran li eynî cihî vegeriya, xwe di neqebekê re bera nav kuçeyan da.
Mekîne li ber apartmaneke bilind rawestand. Herdu destên xwe dane ser direksiyonê û beyî ko ew jî bizanibe bê li kû dinere, ziq li dûranê ni-herî. Bîstikekê weha ma. Xwe bi xwe, di nav şerekî mezin de bû.
Piştî çend deqîqeyên din, bi tevgerin giran ji mekîneya xwe daket û hat ber deriyê dawiyê.
Baran kêm bûbû. Mirov digot qey hema hema nedibariya. Lê, ewrên reş hê jî belav nebûbûn. Feq li ber şevê vedida. Ji xwe ro hatibû ‘esir. Şifêrê dirêj û girs, bi destê xwe yê ko ji hêrsan pûç bûbû derî vekir. Dîsa bala xwe da lêwik û sekinî. Ma gelo ew bibiraya li otêlekê bi cih bikiraya, dê ne baştir bûya?
Na, ne dibû. Him nizanîbû bê ev lawik kî ye, him jî ditirsiya ko heke wî ji xwe biqetîne, tiştekî xerab were serê wî. Wî jî nizanîbû bê ew ji bo çi weha difikirî. Hema dijminê mirov be jî divê mirov li yekî di vê rewşê de
137

be, bi xwedî derkeve.
Dilê wî bi lêwik dişewitî. Ji ber ko ew li ser mezelê Seydo dîtibû jî nêzîkahiyek li hember lêwik his dikir. Hezkirineke weha bû ko wî jî bi wê nizanîbû û nikarîbû bigotaya bê ka ji bo çi bû. Li xwe heyirîbû û mabû. Nikarîbû biryarek bidaya.
Destê xwe bir ber devê xwe û hebekî din jî fikirî. Ew fikrên bîstika din dîsa hatin bîra wî. Bi dû re, di ber xwe de kir ufe uf û sekinî.
Rahişt lêwik û ji mekîneyê daxist. Bi lingê xwe li derî xist û girt. Beyî ko li lawikê himbêza xwe binere û dîsa li ser rastbûn an çewtbûna vê biryara xwe bifikire, ew bir mala xwe.
Robîn heta êvarî nehat ser hişê xwe. Tew demekê şifêr tirsiya ko ev lawikê biyanî di nav lepên wî de bimire. Heta ko ew nehat ser hişê xwe, ew bi tenê nehişt. Qapûtê wî û qazaxê wî yê şilbûyî ji wî kiribûn û eşof-manekî xwe lê kiribû.
Gava ko Robîn hat ser hişê xwe û li dora xwe niherî; ewilî ji tariya hundir pê ve, tu tişt nedît. Dû re, li du zilamên ko xwe dabûn quncikeke odeka teng û bi dengekî nizm dipeyivîn hay bû. Heta ko têbigihêje bê ka li kû ye, dîsa xwe li xewê danî. Çi qasî hewil da xwe jî tiştek nehat bîrê. Ji balafirê daketibû, li teqsiyekê siwar bûbû û çûbû ser mezel. Çend zarokên ko li dora wî civiyabûn jî dihatin bîrê. Mezelê Hemdîn jî hat ber çavên wî. Dû re, çûbû ser mezelê Seydo. Gemara ser axa wî bi kefa destê xwe dabû alî û kulîlka ko ji bêrîka qapûtê xwe derxistibû, danîbû ser axê. Belê belê! Heta vê derê, giş dihatin bîra wî... Le bi dû re? Bi dû re, çi bûbû ji wî?
Kir û nekir nehat bîra wî. Serê wî gêj bû. Dengê herdu zilamên ko ruyê wan di tariyê de dima, kir ko ji nû ve vegere ser wan. Wî ew nas nedikirin.

Na! Qet! Lê belê, çawa hatibû vira?
Tirsiya. Le ko ev zilam kesin xerab bin! Bêtir tirsiya. Herdu zilam hê lê hay nebûbûn ko Robîn hatibû ser hişê xwe û her dipeyivîn. Deng bi di-jwarî dihatê, bes Robîn tê derxistibû ko ev zilamên nenas bi kurdî dipeyivin. Wê gavê, dilê wî hebekî rehet bû û bêhna wî hat ber.
— Dibeje; herkesî digirin, weleh. Divê van rojan, em li xwe miqate bin.
Yê din bi gazind got:
— De her car weha dibe, lo! Çi gava ko navê kurdan were rojevê, weha dikin.
— Lê vê carê, ne weke hercar e, ha! Pir tirsiyane, weleh. Hew dizanin
138

bê ew ê çawa bikin. Çavê dinyayê gişî li ser wan e. Dewletên Ewrûpayê li wan li hemanan e, weleh.
— Kuro, ma herçî Dewletên Ewrûpayê ne, heke ne ew bûna, niha ji zûde ev mesele çareser bûbû. Ew jî tu dibêjî qey hê nû bi me hisiyane.
— Weleh, do televziyonê digot, li Ewrûpayê gelek tişt çêbûne.
Robîn guhê xwe dabû ser peyvên wan. Ji peyvên wan têgihişt ko ev ne ew kesin weha ne ko bikaribin xerabiyê bi wî bikin.
Lê, ev kî ne? Çawa hatibû nav wan?
Herdu zilamên ko bîstika din behsa kurdan dikir, ji nişka ve mijara xwe guhert û dest bi behsa maça Fenerbahçe û Galatasarayê kir. Zimanê xwe jî guhert û vê carê, bi tirkiyeke xerabe dipeyivîn. Wê gavê Robîn lê hay bû ko ew bi wî hisiyane.
Tirkiya zilaman tiştekî din jî anîbû bîra wî. Şifêrê teqsiya ko ew ji bal-afirgehê biribû ser mezel. Gelo ew bi kû de çûbû? Bi kû de wenda bûbû? Ev zilam kî bûn? Çi karê wî li nav wan hebû? Çawa hatibû vira?

Tu îhtimaleke din tune bû. Hebe nebe, wî şifêrî ew anîbû vê derê. Lê çawa? Ma çi bi wî hatibû ko weha ji ser hişê xwe çûbû?
Piştî ko gihaşt vê encamê, dilê wî rehettir bû. Lê, dîsa jî tev neliviya. Heta ko zilaman dev ji wê mijara maça do berda û çixareyên xwe pêxistin, weke ko li benda tiştekî bin sekinîn jî bêdeng ma...
Dilê Robîn dikir gupe gup. Digot qey ew ê aniha bi dengê dilê wî bi-hisin. Wî jî nizanîbû çima, lê nedixwast, xwe eşkere bike. Heke wî şifêrî ew anîbe, divê heta ko ew were ji nav cihê xwe dernekeve. Ji ber ko ji wî pê ve li kesekî din rast nehatibû. Ne mimkûn bû ko ew tiştê lê difikirî, çewt bûya. Miheqeq, wî şifêrî ew anîbû vê derê. Lê di dilê xwe de bawerî bi vêya nedianî.
Heta ko dengê deriyekî ji aliyê din ve ji nişka ve hat û Robîn veciniqî jî zilaman bawer nekiribû ko ew şiyar bûye. Bi dû re, pêjina yekî hat. Çavên xwe girtin û xwe bi heyecan da bende.
Derî vebû û zilamekî silav da û ket hundir. Robîn tavilê dengê wî nas kir. Digel ko gava di mekîneya wî de bû, zêde bi wî re nepeyivîbû jî dengê wî di hişê Robîn de mabû.
Şifêr piştî ko kilîta destê xwe xist bêrîka xwe û çakêtê xwe ji xwe kir, serê xwe ber bi aliyê doşeka Robîn ve kil kir û bi kurdiyeke bi qasî ko bala Robîn bikişîne delal, bi dengekî nizm, pirsî:
— Çawa bû? Mêvanê me bi ser hişê xwe ve nehat?
Ji herdu zilaman yekî bersiva wî da:
139
REŞ Û SPÎ

— Nizanim, wele. Lê, heke tu bixwazî, hela bangî wî bike. Belkî heta niha hatibe ser hişê xwe.
Şifêr, xwe hêdîka bi ser wî de daqul kir û destê xwe da ser milê wî:

— Arkadaş, uyan?k m?s?n? (Heval, ma tu şiyar î?)
Cara ewilî tu deng ji Robîn derneket. Lê hew mabû ko zilam careke din jî bangî wî bike, Robîn hêdîka çavên xwe yên westiyayî vekirin û li wî zivirî. Ji bo ko yên dora xwe pê nehisîne ko ji zû de şiyar bûye, hewleke ecêb dabû xwe. Çavên xwe mîna ko bixwaze bizanibe bê li kû ye, bi mer-aq li dora xwe gerandin. Li herdu zilamên din niherî, li dîwarên ko çend kartpostalên çarçovekirî ko li kêleka wan helbestin hatibûn nivîsandin, niherî. Bi dû re, bala xwe da zilamê ber serê xwe.
Şifêr bi awirin nerm û samimî li wî diniherî û dibişirî. Robîn di serî de gava ko çav li qilafetê wî yê girs ketibû, ji wî tirsiyabû; lê aniha, gava ko çav li van awirên ko dilê mirov germ dikirin û bişirandina samîmî ket, ji ber xwe fedî kir.
— Çok merak ettik, walla. Korktuk. Alt? saatt?r bayg?ns?n. (Me pir meraq kir, wele. Em tirsiyan. Ev şeş saetên te ne ko tu di xew de yî.)
— Ne oldu bana? (Çi bi min hat?)
Zilêm bi ken bersiva dayê.
— Boş ver. Önemlî degil. Sonra konuşuruz. Şimdi kalk hele, git elini yüzünü y?ka sen. (Dev jê berde. Ne muhîm e. Em ê bi dû re bipeyivin. Tu niha rabe hela, here dest û ruyê xwe bişo.)
Robîn lihêfa xwe hêdîka rakir û rabû ser xwe. Serê wî gêj bû û ber çavên wî jî reş bû, xwe bi dîwêr girt. Zilêm da pêşiya wî û ew bir ber kaniyê. Heta ko wî karê xwe xelas kir jî peşkîreke spî di dest de, li bende sekinî. Gava ko dîsa vegeriyan hundir, Robîn berçavka xwe ji destê şifêr girt, peşkîr di dest de hat, bala xwe da çarçoveyeke dîwêr û sekinî. Canê wî pûç
bû û bê tevger ma. Çavên wî dîsa li hemanan bûn. Gava ji nav nivînan derketibû, lê hay nebûbû. Wêneyekî Seydo yî mezin li ser serê wî hatibû daliqandin. Piştî ko çavên xwe hebekî li ser wêneyî gerandin, hêdîka serê

xwe bera ber xwe da û meşiya hat li ser balgîfekê rûnişt.
Tevî şifêrê ko ew anîbû wira, herdu zilamên din jî ziq li wî diniherî.
Gava ko li ber wêneyê Seydo sekinîbû, herdu zilamên din bi awayekî ko tiştinan jê bipirsin, li şifêr niherîbû û sekinîbûn.
Robîn serê xwe rakir, bi çavên xwe yên sorbûyî li şifêr niherî û bi dengê xwe yê westiyayî, hêdîka got:
— Elbiselerîmî verebilir misin? (Tu dikarî kincên min bidî min?)
140

Mêrik piştî ko hebekî fikirî, dengê xwe li gora yê Robîn eyar kir û got:
— Heke tu bixwazî, tu dikarî îşev li vira bimînî.
Berê xwe da aliyê pencereyê û bi dû re dîsa li wî vegeriya.
— Ji xwe, dinya tarî bûye. Û tu jî hê baş nebûyî.
— Na, na. Ez baş im, spas.
Mêrik cihê xwe xweş kir û dîsa bi wê tirkiya xwe ya xerabe, got:
— Binere heval, ez jî nizanim çima, lê min alî te kir. Tu di bin wê baranê de, li ser mezel ji ser hişê xwe ve çûbûyî. Belkî tu ê bibêjî meraq, belkî jî dilsafî, lê min xwast ko ez te nas bikim.
Robîn li erdê diniherî. Mêrik piştî bêdengiyeke kurt, pirsa ko ji sibehê de li serê wî bûbû bela, hebekî jî bi tirs pirsî û dilê xwe rehet kir:
— Ew kesê ko tu li ser mezelê wî bûyî...
Sekinî. Gava dît ko serê Robîn ket ber, poşman bû ko meseleya mezêl vekir. Xweziya xwe daqurtand û bi dû re ji bo ko peyva xwe biqedîne û wê meraqê ji dilê xwe bi temamî derxîne, digel ko wî jî tê de derdixist ko nikare tu bersivê werbigire, dîsa domand:
— Tu wî nas dikî?
Robîn tu bersiv nedayê. Mêrik jî pirsa xwe hew dubare kir. Ji xwe, piştî wê bêdengiya ko li dû pirsa wî li hundir belav bûbû, ew jî têgihiştibû ko

nebaş kiribû. Fedî kir. Li ber xwe ket. Herdu zilamên hevalên wî jî ev rewş fahm kir û mîna ko ew bûbûn sedema vê rewşê, ketin ber fediyê. Ji lewre, heta ko Robîn ew di meraqeke mezintir de hiştin û ji mala wan derket jî mîna ko qebeheteke mezin hatibe kirin, hew li ruyê hev niherî û tu deng jî ji kesî derneket.

3. Dilo rebeno, lo dilo...

Bûbû êvar. Barana ko bi roj dest pê kiribû û hê jî dibariya. Lê serma jî hebekî şikestibû. Bi tenê bayekî hênik ko mirov jê aciz nedibû, dihat. Ezman ne xuya bû.

Erd hê jî şil bû. Li derve, ji çend mekineyên ko ber bi bajêr ve diçûn pê ve, li tiştekî din rast nehat. Kolanên ko tê re dibihurî, di bin ronahiya lempeyên dîrekan a qels de, ew dibir demên berê.

Zaroktiya wî di wêneyekî vî bajarî yî kevin de mabû. Wê gavê, hejmara avahiyên bilind ne ewqasî zêde bû. Sînorên dora bajêr, ne ewqasî fireh bûn. Gelek kolanên ko niha çav lê diket jî ne asfaltkirî bûn. Belkî ew bajarê ko dihat bîra wî jî êdî di wêneyên zarokatiya wî de mabû. Herdu bi

hev re, di nav gelek wêneyên din de, di torbeyekî naylon de, li refika pirtûkxaneya wî mabûn. Belkî, tiştê ko ji wan û bîraninên wan deman mabû jî hew ev bû.

Li van kolanan hindik negeriyabû. Gava ko hê nû li xwe û li dinyayê hay dibû, wê gavê bi wê lêhaybûna xwe re nû bi nû fêrî bitenêtiyê jî dibû. Gelek caran, bi tena serê xwe li van kolanan û gelek yên mîna wan, beyî ko ew jî bizanibe bê ji ber çi sedemê bû bê serî geriyabû. Çend caran, ev adeta wî li serê wî bûbû bela jî. Ji ber ko heta derengê şevê li derve digeriya, hindik caran neketibû qereqolan û ji polîsan hindik lêxistin

nexwaribû.
Ev kolanên ha û gelek kolanên din yên vî bajarî, bûbûn destbirakên wî yên kul û derdên dilê wî. Di dema xwe de, wan ew bi hemû xusûsiyetên wî nas dikir. Her gava ko serê wî diêşiya, tavilê xwe diavêt himbêza wan û ji bo ko dilê xwe aş bike, kul û derdên xwe hebekî ji bîr bike, heta ko ji ser hişê xwe ve diçû û serê wî bêtir diêşiya, dimeşiya. Belkî bi wî awayî, dilê wî rehet dibû; belkî jî ew kul û derdên dilê wî bêtir tev radibûn û bêtir diket nava bitenêtiyê.
Wî ev kolan baş nas dikirin. Ji lewre, niha gava ko dîsa eynî mîna wan rojan, bi êşa serê xwe ji ser hişê xwe ve çûbû û dimeşiya, digot qey kolan jî wî nas dikin, mîna ko mirov hevalekî xwe yê kevin bibîne, bi çavin xemgîn bala xwe dabû dora xwe. Lê belê, bi çavin fedîkar jî.
Gava ko li xwe û li ewqas salên çûyî fikirî, wî jî bi xwe didît ko hê Robînê berê ye, qet nehatiye guhertin. Belkî jî hingî di nav janên ko di her roja çûyî de zêdetir dibûn de vegevizîbû, êdî ew roj nedihatin bîra wî. Digot qey hema bi vî halî ji diya xwe bûye û ji cerga ko bi xwe dizane jî, di vê rewşê de ye. Robînê piçûk yê ko di van kolanan de bi kêf baz dida, dilîst û stran digot, êdî hew dihat bîra wî.
Gava ko li vê yekê fikirî, lê hay bû ko ji zû de stran negotiye. Cara dawîn, li ber tembûra Bedirxên çend stran gotibûn. Bedirxan û Mîtanî hatin bîra wî. Malbata wî... Gulcan...
Niha çi dikirin gelo?
Giş yek bi yek hatin ber çavên wî û bihurîn. Ji ber ko li gora wî, ew li serê gişan bûbû bela û ji bo ko bêyî wan hatibû vira jî neheqiyeke mezin li wan kiribû, dilê wî bi wan şewitî û li ber wan diket. Belkî jî niha ji ber wî, jiyana wan tev de li bin guhê hev ketibe. Belkî niha giş li her derê li wî digerin. Belkî jî ji bo vê wendabûna wî ya ji nişka ve, tev de perîşan bûne û mane.

Serê xwe kil kir, kelogirî bû. Bû fiş fişa wî û hêdî hêdî di ber xwe dest bi stranekê kir.
... dilo rebeno lo dilo, dilo feqîro lo dilo
dilo şewitiyo lo dilo
dilo peritiyo lo dilo...
Gava ko gotinên vê strana kevin, ko ew jî nizane bê ji kû hat bîrê, ji devê wî derdiketin, hêsirên ko bi wî bayê hênik dicemidîn jî li gora melodiya stranê, xwe ji ser hinarikên wî hêdî hêdî bera jêrê dida û şopa xwe di ruyê wî de dihişt.
Diviyabû çi bikira? Wî jî bi xwe nizanîbû. Gava ko ji bo hatina Diyarbekirê biryar dabû, ji xwe re tu program çênekiribû. Negotibû, ez ê herim vira û wira. Ji lewre, aniha dîsa aciz bûbû. Nizanîbû bê ew ê bi kû de biçûya. Heke bixwastaya, dikarîbû niha sed malên ko dê bi kêfxweşiyeke mezin wî biezibînin û li cem xwe vehewînin, peyda biki-rana.
Di bin wê barana ko çipik çipik dibariya de, beyî ko bi zanebûn berê xwe dabe aliyekî, bê serî meşiya. Lingên wî, ew ber bi kolanên teng û dirêj ve bir. Qet hayê wî ji dora wî çênebû jî. Gava ko ji nava wan kolanên tarî derket, di bin tava heyvê de, li biniya bircên xerabe, li xwe hay bû.
Ew bircên ko xerca wan bi spîka hêkan hatibû çêkirin, bi hemû be-dewiya xwe li ber çavên wî sekinîbûn. Bala xwe da xetên kevin ên li ser wan, destê xwe di wan de da. Efsaneyên ko di zarokatiya xwe de li ser Keleha Diyarbekirê bihîstibûn hatin bîra wî. Piçekî xemgîn bû pê re. Mîna ko di wan keviran de, li tiştin wendayî bigere, destê xwe li ser wan digerand. Serê xwe rakir, di bin mijangên xwe yên dirêj î mîna yên keçikan re, bi çavên birqokî li bilindbûna wan niherî. Di ser bircên bilind

re, heyv xuya dibû.
Di pêlikên ko bi keviran hatibûn çêkirin re, derket ser bircan. Gava ji bo ko nekeve, xwe bi keviran girt, destê wî bûbû herî. Destên xwe bi pantorê xwe paqij kir û meşiya.
Baran kêm bûbû. Ew bayê hênik hê jî dihat. Ji doraliyê, bêhneke xweş ko bêhna mirov fireh dikir difûriya. Li hebekî dûranê, li jêrê, şewqa lempeyên bajêr xuya dibû. Piştî ko bala wî ji ser hin cihên bircan yên ko ji hev ketibûn çû ser dora wî, hat cihekî fireh û sekinî. Herdu destên xwe dan noqa xwe û bala xwe da wê dîmena bajêr a bêhempa.
143
REŞ Û SPÎ

Mîna ko bixwaze wî bajarî himbêz bike, lê diniherî. Çavên wî yên ko di bin tava heyvê de dibiriqîn, piştî ko demeke dirêj li bajêr niherîn, hêdîka dageriyan jêrê.
Westiyabû. Beyî ko bifikire ko ew ê kincên wî edem bibin, çû li ser kevirekî rûnişt. Destên xwe li nava xwe li hev gerandin û dîsa bala xwe da bajêr.
Ji dûranê, dengê stranekê dihat wî. Xuya bû ko ew dengê zîz bi kerb bû. Bi wî bayê hênik re dihat û li nav bircên xerabe belav dibû. Guhên xwe bel kirin û li wî dengî guhdarî kir. Wî melodiya vê stranê nas dikir, lê tu tişt ji gotinên wê fahm nedikir.
Hêdîka rabû û berê xwe da wî aliyê deng û meşiya. Wê gavê dît ko germahiyek jî ji wî aliyî tê. Çû û li ber dîwarekî kavil sekinî. Vê carê, gotinên stranê jî baş dihatinê.
... ey dîlberê, ay dîlberê
ey nazikê, wey esmerê...
Tev neliviya. Heta ko wî dengê zîz strana xwe qedand, lê guhdarî kir. Dû

re, bû fiş fişa yekî, bêvila xwe dikişand. Dengê kuxikeke xurt jî hatê. Piştî wê, bêdengiya bîstika din, dîsa xwe li doraliyê belav kir.
Robîn fikirî. Xwast ko here cem wî dengbêjî, lê hebekî tirsiya jî. Di nav wê bêdengiyê de, piçekî din jî sekinî. Dû re, rabû ser xwe û ji paş dîwarê kavil derket.
Li cihekî fireh, mîna cihê ko bîstika din ew lê bû, du zilaman agirek dad-abû û xwe dabû dorê. Şewqa êgir dida ruyê wan û dora wan jî rohnî dikir. Rîha yekî ji wan dirêj bûbû û qapûtekî kevin li piştê bû. Xwe li ber êgir xûz kiribû, ji şûşeya destê xwe tiştek vedixwar û li kesê hember xwe diniherî. Umrê wî, li dora çilî bû. Bes dibe ko ji ber rîha xwe weha kal xuya dikir. Yê din, hebekî ji wî ciwantir bû. Rîha wî jî hatibû, lê ne bi qasî rîha yê din dirêj bûbû. Çaketek û şalekî qetiyayî lê bû û serê xwe bera ber xwe dabû û
kil dikir. Li ber wî jî şûşeyek hebû. Xuya bû, yê ko stran digot ev bû. Herdu jî li Robîn hay nebûbûn. Lê, Robîn ji bo ko wan netirsîne û hayê wan ji xwe çêbike, kir ko dengê lingên wî biçe wan. Berê, zilamê rîhdirêj li aliyê deng zivirî, bi dû re jî yê din serê xwe rakir û li wî niherî. Robîn bi awayekî fediyokî be jî silav li wan kir û hat ba wan. Ji bo ko tiştekî din neyê bîra zilaman, li ber êgir sekinî û bala xwe dayê.
Çavên herdu zilaman li wî bûn. Zilamê rîhdirêj silava wî lê vegerand û
144

bi tirkî, bi dengê xwe yê westiyayî û devê xwe yê ji şerabê sistbûyî, got:
— Kerem bike.
Robîn dizanîbû ko divê tiştekî ji wan re bibêje. Piştî ko zilamê din ke-virek nîşanî wî da û rûnişt, destê xwe li ber êgir germ kir. Li zilamê rîhdirêj zivirî, bi destê xwe dîwarê kavil nîşan da û bi kurdiya xwe ya kubar, got:

— Ezbenî, ez jî li paş vî dîwarî rûniştibûm. Dengê we hat min, min got ez rabim herim cem van camêran.
Yê rîhdirêj ji ber ko Robîn bi kurdî peyivîbû, şaş bûbû; lê nehişt ko ew bi vêya bihise. Yê din ji xwe li tiştekî hay nebûbû.
— Ser çavan.
— Ser û çav neêşin.
Zilamê rîhdirêj bala xwe da Robîn. Wî ev lawik tu carî nedîtibû. Li porê wî yê tevlihevbûyî niherî, li kincên wî yên gemarî niherî, bi dû re bala xwe da ruyê wî yê xweşik û rîha wî ya ko xuya bû, ev çend roj in ko nehatibû kurkirin. Eynî dişibiya kesên esrarengîz yên filîman. Ji ruyê wî mirov tê derdixist ko mirovekî xwende bû, zane bû; lê heke weha bûya, çima di nav van kincên gemarî de bû. Mirov digot qey riya xwe şaş kiribû û di van deran re derketibû. Belkî ne li ser hişê xwe bû jî.
Na! Na , wî ev lawik nas nedikir. Ne ji van deveran bû. Lê, kurdiyeke wî ya kubar û delal hebû. Ev yeka ha, bûbû sedema ko baweriya xwe bi samîmiyeta wî bîne. Di nav kesên ko wî ew nas dikirin de, hejmara kesên weha xweş û paqij bi kurdî dipeyivîn, ne zêde bû. Hebekî din fikirî. Dû re, çavên xwe qels kirin û mîna ko tiştinan di mejiyê xwe de bi hev ve girê bide, bi wî awayî bala xwe da Robîn û sekinî. Paş situyê xwe xurand, dîsa di bin çavan re li wî niherî û fikirî. Serê xwe mîna ko dilê wî bi Robîn şewitîbe hejand û bera ber xwe da.
Berî niha bi çend rojan, yekî din jî mîna vî lawikî hatibû vê derê, ew jî nedişibiya Diyarbekiriyan. Ecêb e, herdu jî mîna hevdu ji nişka ve derketibûn ortê. Kurdiya herduyan jî weke hev xur û paqij bû. Yê din jî mîna viya, riha wî hatibû û kincên wî gemarî bûbûn. Ji peyva wî xuya dibû ko ew jî mîna viya, yekî xwende bû. Zilêm dîsa li wî niherî û bi vê niherînê re ruyê lawikê din jî anî bîra xwe. Robîn xwe li ber êgir germ dikir.
— Kerem bike, tu jî qurtekê vexwe.

Zilêm şûşeya destê xwe dirêjî wî kiribû. Robîn li ruyê wî niherî. Bi wê samîmiyeta wî ya ko xwe bi bişirandineke fediyokî dida der re, hemû belengaziya wî ya ji çavên wî yên westiyayî û kortçûyî dihat xwendin jî

derdiket meydanê. Robîn jî pê re bişirî, bi tiliyên xwe yên ziravik berçavka xwe rast kir, şûşe ji destê wî girt û bir ber devê xwe.
Zilêm bi awayekî ko mirov ji ber neêşe, mîna ko ji bo wî tiştekî girîng be, bi dengê xwe yê ko ji serma mîna pelên çilo dilerizî, pirsî:
— Tu ji kû yî, keko?
Robîn mîna ko li benda vê pirsê bû, berê hebekî fikirî, bi dû re li wî zivirî. Dîsa li ruyê wî niherî. Şûşeya ko mêrik bîstika din dabûyê, dîsa bir ber devê xwe û qurteke din jî jê vexwar. Şûşe danî erdê, bîstikekê bala xwe
da wê û bêdeng sekinî.
Di ber xwe de got:
— Ez ji vira me.
Zilamê rîhdirêj, dîsa bi eynî awayî got:
— Min qet tu li vira nedîtiyî, ji ber wê...
Robîn peyva wî bi kubarî birî.
— Ez dizanim.
Zilamê rîhdirêj digel ko peyva wî nîvco mabû jî piştî vê peyvê sekinî. Hebekî fedî jî kir. Ji ber îmaja Robîn ko di serê xwe de çêkiribû, li ber xwe ket. Serê wî ket ber wî. Sorbûna ruyê wî bi tîna agirê ko xwe didayê dihat veşartin. Dû re, serê xwe rakir, ji ber ko dizanîbû ko Robîn dê xwe negire û dawiya peyva xwe bîne, xwe da benda wî.
Robîn çavên xwe hebekî li dora xwe gerandin, li ronahiya lempeyên ba-

jêr ko ji jêra bircan xuya dibûn niherî, keserek kişand û lê zêde kir:
— Ez ji zû de nehatime van deran...
Piçekî rawestiya û bi dû re dîsa dewam kir:
— Ez niha li dora xwe diniherim... ev bajar çi qasî hatiye guhertin!
Piştî vê peyvê sekinî, behna xwe berda. Zilamê rîhdirêj bala xwe dabû wî û tevgerên wî. Yê hember wan ko serê xwe bera ber xwe dabû û mîna ko dinaliya, di ber xwe de distira jî beyî ko hayê wî ji wan hebe, carê şûşeya xwe dibir ber devê xwe û vedixwar.
Robîn bi destê xwe li jêra bircan deverin nîşan dan û got:
— Ez li Xençepekê mezin bûm. Wê demê jî her gava ko bêhna min teng dibû, ez dihatim vê derê û heta sibehê dimam. Heta ko xewê zora çavên min bibira û ez biwestiyama, min stêrikên ezmên yek bi yek dij-martin û navên hevalên xwe li wan dikirin.
Sekinî. Wê gavê, zilamê hemberî wan, yê ko bîstika din distira, şûşeya destê xwe rakir û bi kêf got:
— Noş, keko. Tu bi xêr hatiyî.
146

Herdu jî li wî zivirin û bişirîn. Robîn jî şûşeya xwe li ber ya wî rakir û serê xwe bi ken li ber tewand. Zilamê ko bîstika din stran digot, piştî ko ji şûşeya destê xwe qurtek vexwar û daqurtand, bi wî dengê xwe yê bikerb
dîsa dest bi stranekê kir. Çavên wî yên ko ji ber şerabê sor bûbûn, li ber şewqa êgir dibiriqandin.
Dengê wî di nav wê bêdengiya êvarê ya giran de li doraliyê belav bû û geriya. Bi dengê wî, yên din ji ser hişê xwe ve diçûn. Ji ber şeraba ko ji êvar
de vedixwe, bi vê stranê êdî wî jî nema dizanîbû bê çi dike, çi dibêje; gêj

bûbû û çûbû. Dengê wî mîna melodiyeke kevin ko keman jî li ber lê dikeve derdiket. Dengê bayê ko leza xwe xurt dikir û agirê ber wan dihejand jî jê re dibû muzîka fonê.
bextê te me ay ay gundî û cîran bêjin
ev ê hanê çi ne
bêje hekîm loqman e hatî li ser e li min
ez xirabmal im yeman
ez bendewar im yeman
serê çendî çend salan e ez li hêviya te me
min terka miletê xwe da
ez li dû te mame ay ay...
Piştî ko stran qediya û zilêm hêdîka dengê xwe birî, çendekî bêdengiyeke ko wan ji berê serxweştir bike, hat û xwe li dora wan pêça. Wê gavê, tariya
ko li dora wan girtibû, hebûna xwe bêtir nîşanî wan da. Bayê ko bi zorê ji diwêr difilitî, xwe li êgir dixist lê nikarîbû vemirandaya. Gava lê hay bûn ko dinya her ko diçe sartir dibe, bêtir ber bi êgir ve hatin û xwe xûz kir. Wê gavê, dengê zilamê rîhdirêj, bêdengiya doraliyê belav kir.
— Wê rojê, yekî din jî mîna te hatibû vê derê.
Çavên Robîn ji nişka ve fireh bûn. Dilê wî kir gupe gup. Beyî ko tiştekî din bike, ziq li zilêm niherî û xwe da benda peyva wî. Vê heyecana ko ji nişka ve di dilê Robîn de çêbûbû û xwe dabû der, bala herdu zilamên din jî kişand.
Mêrik dîsa bi awayê şermokî domand:
— Ew jî ji Stenbolê hatibû.
Piştî ko hebekî sekinî û berê xwe bi êgir ve kir û dewam kir.
— Ji ber ko kurdiya te jî mîna ya wî paqij bû, bala min kişand. Ew jî nedişibiya ên van deveran û bi kurdiyeke kubar dipeyivî. Ruyekî wî yî

ecêb hebû.
Dû re, lê zêde kir:
— Ev hûn çawa dikarin weha xweş bi kurdî bipeyivin, lo?
Robîn hê jî li benda peyva wî ya berê bû. Mîna ko pirsa wî ya vê dawiyê nebihîstibe, bi heyecan pirsî. Zilamê rîhdirêj ji vê rewşa wî tirsiya.
— Bi dû re çi bi wî lawikî hat? Bi kû de çû?
Zilamê rîhdirêj xwast ko têbigihêje bê ji bo çi viya li wî lawikî dipirse.
Dû re, mîna ko aciz bûbe, herdu destên xwe ber bi jorê ve rakirin û got:
— Weleh, ez nizanim. Piştî ko hebekî bi me re vexwar, rabû û çû. Dû re, me ew hew dit. Ma tu çima lê dipirsî? Qey tu wî lawikî nas dikî?
Serê Robîn hêdîka ket ber. Piştî ko hebekî fikirî û serê wî ji berê bêtir êşiya, destên xwe xistin nava porê xwe û bir û anîn. Serê xwe rakir û li êgir
niherî. Mîna ko canê wî êşiyabe an jî mahdê wî ji tiştekî xeliyabe, ruyê xwe tirş kir. Herdu zilaman ziq bala xwe dabû wî.
Robîn tu bersiv neda xwediyê pirsê. Mîna ko li şifêrê teqsiyê û hevalên wî kiribû, ev zilam jî di nav meraqeke mezintir de hiştin û rabû ser xwe. Wan bi tenê bi çavên miştmeraq li wî temaşe dikir. Herduyan jî digot qey ev herdu lawikên ko bi kurdiyeke paqij dipeyivîn û zêde behsa xwe nedikir, ji derve hatibûn, belkî jî bi karekî ko aqilê wan nedigihiştê mijûl dibûn û ji ber vê yekê, pirsên wan bêbersiv dihiştin. Ji lewre, wan newêrîbû dengê xwe derxistaya û bela xwe di wan de bidaya.
Robîn beyî ko tiştekî ji wan re bibêje, xatir jî ji wan nexwast û bi dûr ket. Zilamê rîhdirêj piştî ko Robîn bi dûr ket, rabû ser xwe ji ser bircan li çûna wî niherî. Piştî ko siya wî jî di nav tariyê de wenda bû, dîsa hat li şû-

na xwe rûnişt û xwe da ber êgir. Lê ji ruyê wî xuya dibû ko ew ê tu carî van herdu lawikên biyanî û ecêb ji bîr neke.
Herçî Robîn bû, heta ko ji wira bi dûr neket jî lê hay nebû ko xatir ji wan nexwastiye û rabûye. Eyb çêbû. Zilaman cih di nav xwe de dabûyê, hiştibû ko ew jî xwe li ber agirê wan germ bike. Ya herî mezin jî ew bû ko wan şeraba xwe bi wî re par ve kiribû. Gava ko li vana fikirî, pir li ber xwe ket, fedî kir. Heta ko gelekî meşiya û beyî xwe hat li ber devê goristana ko
bi roj hatibûyê sekinî jî ji bîra wî neçû.
4. Şop...
Hê nû li xwe hay bûbû ko beyî xwe daye ser şopa Bişêr. Çawa dibe ko herdu jî tiştên mîna hevdu bikin? Ecêb e. Belkî jî ne ewqasî girîng be, lê
148

ev rastlêhatineke ecêb e, bi rastî. Bişêr tu şop li dû xwe nehiştiye. Lê ji niş-
ka ve, li cihekî ko sed salî bifikire jî nayê bîrê, li cem du zilamên araqvexwir ko di jiyana xwe de, ew tu carî nedîtine, li şopa wî rast tê. Heke weha be, qedera wî bi ya yekî din ve dihat girêdan û wî yekî çi kiribe, ew ê jî eynî tiştî bike. Lê, le ko Bişêr tiştekî ko ew ê tu carî neke jî kiribe. Tirsiya, lê ji ber ko nizanîbû bê çi hatiye serê Bişêr, bêhtir tirsiya. Niha jî dîsa hatibû li ber goristanê sekinîbû. Lingên wî ew beyî wî anîbû vê derê. Çi karê wî hebû li vira, çawa ji xweber hatibû û li ber devê goristanê bi xwe hisiyabû, wî jî nizanîbû.
Di ber xwe de got
— Zilamê Kal..!
û sekinî. Li hundirê goristanê niherî.
Ji piçûkanî de, ji goristanan ditirsiya. Rojekê, yekî jê re gotibû ko gava

dibe êvar û dinya tarî dibe, hemû mirî radibin ser xwe, nobedariya goristanê dikin. Kî di cem wan re derbas bibe, destê xwe dixin qirika wî û difetisînin. Bi dû re jî xwîna wî vedixwin û laşê wî diavêjin ser riyê.
Niha, hew ji tiştên weha bawer dikir û tu carî jî nedîtibû ko ev mesele rast derketiye; lê dîsa jî ditirsiya. Wî jî bi xwe nizanîbû bê ji bo çi ditirse. Hat bîra wî ko di zarokatiya wî de, gava ev tişt jê re dihatin gotin, heval mevalên wî gişan derzî û merxez bi xwe re digerandin. Ji ber ko li gora kesê ko ev mesele ji wan re digot, ger mirov tiştekî hesinî bi xwe re bigerîne, hingê pîrhebok jî ji mirov ditirsin. Lê wî nizanîbû bê tiştê ji bo pîrhebokan dihat gotin, ji bo miriyan jî derbas dibû an na. Ji xwe, ger ji bo miriyan derbas bibûya jî niha ne derziyek û ne jî merxezek bi wî re hebû. Gava li vana fikirî, him di ber xwe de keniya him jî xwast ko aniha merxezek di beskura qapûtê wî de hebûya. Ji lewre, çavên xwe bi tirs li dora xwe digerandin û bê hemdê xwe destê xwe di bêrîka xwe de li tiştekî digerand..
Bi tirs, lê weke ko vê tirsê ji xwe veşêre, ket hewşa goristanê. Tarî bû. Tava heyvê siya wî li paş wî dihişt. Şev, mirov çi qasî bikaribe fikire, ewqasî bi tirs û bê deng bû. Robîn ziq li pêşiya xwe diniherî. Digot qey aniha hin kes dê xwe ji paş de biavêjin ser wî. Newêrîbû ji bo ko wê tirsê ji dilê xwe biavêje li dû xwe jî biziviriya.
Heke ne weha bûya û gava ko biziviriya çav li siya xwe biketaya, belkî bêtir bitirsiya. Ji bo ko netirse, tevî ko li hewşa goristanê bû jî di dilê xwe de stranên reqsê digot û dimeşiya. Dîsa jî carê gotinên wan stranan ji xweber dihatin guhertin û dibûn ko Robîn wan ji bîr bike.
149
REŞ Û SPÎ

Gava gihaşt ber gora Seydo, tirsa xwe ji bîr kiribû jî. Ji ber ko ji nişka ve

ruyê Seydo hatibû ber çavên wî û bala wî kişandibû ser xwe. Robîn hebekî din lezandibû. Digot qey rastî ye. Gava ko hebekî din meşiyabû, ruyê Seydo hêdîka di nav tariyê de wenda bûbû. Robîn dîsa jî nesekinîbû. Heta ko li xeyalbûna wê dîmenê hay bû û gihaşt ser gorê, hêsirên wî xwe bera jêrê dabû jî. Dû re, gava ko Robîn li vê şevê bifikiriya, dê bi xwe lê hay bibûya ko heke di wê rewşê de ruyê Seydo nehataya ber çavên wî, belkî wî ê nikarîbûya tirsa xwe ji bîr bikiraya û li wira bimaya.
Aniha, hinan ew bidîtaya, dê bigotaya qey vî lawikî aqilê xwe wenda kiriye û dîn bûye. Li ber gorê rûniştibû, berê xwe dabû aliyê derî û mîna ko li benda hinan be, sekinîbû. Newêrîbû li axê binihere. Her gava ko berê xwe dida gorê, cendekê Seydo yê bibirîn dihat ber çavên wî. Gava ko
di bin wê barana bi roj de hatibû ser gorê, ev tişt nehatibû bîrê. Demeke dirêj bi wî awayî sekinî. Ji cihê xwe tev jî neliviya. Dinya reş û tarî bûbû. Dengê fizîna bê, bitenêtiya wî bêtir dianî bîra wî. Deng mengên tenekeyên ko li ser kolanê ji ber bê dileqiyan, carê ew ditirsand. Di nav wê reşahiyê de, carinan çavên wî ew dixapand û wî digot qey dû-manek ji ser goran ber bi jorê ve bilind dibe. Dû re, ew dûman dibû beş bi beş û her beşek dibû pîrhebokek û ber bi wî ve dihat. Her gava ko we-ha dibû, çavên xwe diqirpandin û didît ko ji tirsan, van tiştan dibîne. Wext derbas nedibû. Pêjina însanekî jî nedihat. Mirov digot qey her ko diçe dinya tarîtir dibe. Herçî ba bû, mîna ko ew jî westiyabe, leza xwe kêm kiribû.
Robîn ji bo ko ji gorên dora xwe netirse û tiştên ko tirsê têxe dilê wî neyne bîra xwe, li ser hevdu çixare pêdixistin. Hingî li wira rûniştibû û ziq li aliyê derî niherîbû, çavên wî jî qerimîbûn.
Pakêta wî hindik mabû ko xelas bibe. Ber lingên xwe tije boçikên çixareyan kiribû. Çixareyeke din jî pêxist û ya di destê xwe de ko li ber xe-

lasbûnê bû, avêt erdê. Ji nişka ve reşek ber bi çavên wî ket. Weha his kir ko bizinek di ber deriyê gorê re bihurîbû û li aliyê wî niherîbû. Ji çavên bizinê, sorahiyeke piçûk fûriyabû.
Di piçûkaniya wî de jê re hatibû gotin ko carinan pîrhebok xwe dixin şiklê bizinan û derdikevin hemberî mirov. Tirsiya. Dikira bibizdiya. Nema wêrîbû li wî aliyî binihere, lê ji bo ko tirsa xwe ji ser xwe biavêje, rabû ser xwe û li aliyê ko reş ber bi çavên wî ketibû niherî. Tu tişt xuya nedibû. Newêrîbû derketaya û bidaya pey wî reşî jî. Dîsa li şûna xwe rûnişt û mîna berê, bala xwe da aliyê derî.
150

Vê carê, hebekî bêtir tirsiyabû. Bes tu carî negot ko ka ez çima ji vê goristanê dernakevim. Ew ê li wira bimaya. Ev biryareke qet'î bû. Ji ber ko li du tiştên din hay bûbû. Dabû ser şopa Bişêr, ev yek; ya duduyan jî ne mimkûn e ko şopa Bişêr ji xweber derketaya ser riya wî. Va ye, beyî xwe hat vegeriya ser gora Seydo jî. Belkî ev yek fantaziyeke vala be jî lê di-
gel lêhaybûna xwe ya li ser fantazîbûna van tiştan, carinan mirov ji fan-
taziyên xwe jî bawer dikin. Tiştê ko ew bi jiyanê ve girê dida jî ev bû ji xwe. Rehetiya mirov ya jiyanê û hizûra wî çi qasî kêm be, fantaziyên wî jî ewqasî pir dibin û xurt dibin.
Wî jî nema dizanîbû bê ev çend saet in ko li ber gorê rûniştiye. Pakêta wî qediyabû. Pelçiqandibû û ew jî avêtibû cem boçikan. Westiyabû. Di nav hezar celebên ramanan de û bi tirsa ko miriyek rabe û were dest têxe qirika wî, an jî pîrhebokek xwe têxe şiklê bizinekê û were xwe biavêje ser wî, serê wî ketibû ber û di xew re çûbû. Hêyv nêvî bûbû û diket paş ewrên nexuyayî. Ezman hêdî hêdî bi temamî reş û tarî dibû.
Destekî mezin hêdîka hat û li ser milê wî sekinî. Robîn bi xwe nehisiya.

Wî destî carekê ew hejand û Robîn ji nişka ve çavên xwe vekirin. Gava ko li xwe hay bû bê li kû ye û di wê tariyê de çav li kesê hember xwe ket, ji tirsa xwe tu nemabû ko laşê wî giş bibûya qêrîn û biteqiya. Destekî din hat û li ser devê wî sekinî. Lal bûbû. Serê wî gêj bû. Ber çavên wî reş bû. Dikira ji ser hişê xwe ve biçûya, zingîniya sîleyekê ji bin guhê wî hat. Mîna ko mirov darekê bihejîne, ew jî carekê hejiya. Bi dû re, sîleyeke din jî lê ji ya berê xurttir…
Çavên wî vebûn. Ziq li kesê hember xwe niherî. Dikira dîsa mina bîsti-
ka din ji ser hişê xwe ve biçûya, dengê nerm yê kesê hember ko mirov dig-
ot qey ji binê bîreke kûr dihat, ew şiyar kir.
— Robîn!
Robîn dev ji livandina xwe berda, xwe di nav lepên wî de rast kir. Wî kesî ew hêdîka berda û sekinî. Ruyê wî bi zorê xuya dibû, lê Robîn dikarîbû tê derxistaya ko kesê hemberî wî yekî weha qilafetgirs bû. Piştî ko hebekî din lê niherî, ruyê kesê hemberî wî bi carekê ve biriqî û ew ruyê mîna ko nûr jê dibariya derket holê. Rîha wî ya ko ji adetê dirêjtir bû, bi dû re jî porê wî yê dirêj ko ji paşiyê ve hûnandibû, xuya bû.
Hilma xwe bi zorê distend. Sînga wî bi lez radibû û dadiket. Piştî ko hilma wî hat ber wî û wî ew kesê li hember xwe nas kir, dilê wî bêtir re-
het bûbû. Bi çavên biberger li ruyê wî kesî diniherî.
— Alî min bike! Rêyekê bide ber min! Ez xulam, ez di dexlê te de me...
151
REŞ Û SPÎ

Serê xwe hêdîka bera ber xwe da û giriya. Heke negiriyabûya, belkî dê nikarîbûya hêrsa xwe vala bikira.
— Ji bo Xwedê! Rêyekê bi ber min bixe. Min xelas bike...

Kesê hember wî dîsa bi wî dengê xwe yê ko mirov ecêbmayî dihişt û dixist bin bandora xwe, got:
— Min berê jî ji te re gotibû, Robîn. Ez nikarim tu riyan bi ber te bix-im û ji bilî te, tu kes nikare te xelas bike.
Zilamê Kal serê xwe rakir û li ezmanê ko bêhna sibeheke nû jê dihat ni-herî.
— Binere, rojeke nû dike hilê. Tu ji bo çi ewqasî bi rik î? Tu hema xwe bi destên van xeyalan de berdidî. Bes e, êdî li xwe binere. Tiştekî bike.
Serê Robîn di ber wî de bû. Zilamê Kal piştî ko hebekî bala xwe dayê, got:
— Tiştekî bike, Robîn! Tiştekî nû ko bikaribe hemû jiyana te biguherîne...
Zilamê Kal destê xwe dîsa danî ser milê wî, mist da û dubare kir:
— Divê tu tiştekî bikî, Robîn. Tiştekî nû...
Peyva wî ya dawiyê, çend caran di guhên Robîn de olan da û belav bû. Bayekî hênik hat û xwe li nav porê wî xist. Qerisî. Gava ko serê xwe rakir, Zilamê Kal dîsa wenda bûbû; lê dengê wî hê di guhê Robîn de olan dida:
— Tiştekî bike, Robîn. Tiştekî bike...
5. Sond... heta mirinê... çi bibe jî...
»tu ji nav hemû janan janekê bîne ji min re
û hemû sûcên ko li te hatine birrîn...«
Dibe ko ji ber destê sibehê bû jî dinya pir sar bû. Seqema ko hebû, kiribû ko cihokên li kêleka riyan jî qeşa bigirin. Darên derûdorê giş tazî mabûn. Zivistanê li Diyarbekirê, cihê xwe xweş kiribû. Êdî xuya bû ko ew ê berf jî bibariya.
Robîn şeva çû, heta ko li ber wê seqemê ji ser hişê xwe ve çûbû, li goris-tanê mabû. Zilamê Kal dîsa anîbû bîra wî ko divê ew tiştinan bike. Nikarîbû bifikiriya. Qerisîbû. Îmana wî ji dinyayê çûbû. Belkî di vêya de

rola edembûna kincên wî û bêbiryariya wî ya li ser kirina gelek tiştan jî hebû. Belkî ji ber ko di wê şevê de li derve mabû, weha difikirî. Wî nema dizanîbû.
152

Ji wî pê ve, li derve tu kes tune bû. Wî dizanîbû, wê saetê li derve, bi tenê qesas û araqvexwir mabûn. Ew jî niha di quncik muncikan de bûn. Heke hebekî din jî ber bi nava bajêr de biçûya, ne mumkun bû ko li polîsan jî rast nehataya. Wê saetê û li Diyarbekirê, mirov herî bêtir ji polîsan ditirsiya. Heke wan ew bidîtaya, belkî ew jî ji wî bitirsiyana. Nizanîbû bê divê çi bikiraya. Bi dû re, beyî ko biryarekê bide, xwe di nav wê tariyê de û bi dizî, gihandibû mala Elî. Li ber derî çendekî sekinîbû. Li dora xwe û li ezmên niherîbû, bi dû re hêdîka du caran li derî xistibû û sekinîbû. Demekê, deng ji hundir nehatibû. Di wê navê re ew jî li xwe poşman bûbû ko hatibû wira. Lê bi dû re, hê ew li poşmaniya xwe difikirî, dengekî bitirs ji hundir hatibû.
— Kî ye?
Robîn gava dengê Elî seh kiribû, ketibû ber fediyê. Di serî de bersiv nedabû, xwastibû bi şûn de vegere, lê bi dû re bi zorê gotibû, »ez im«. Fahm kiribû, ko kesê li paş derî, dixwaze dengê wî nas bike. Sekinîbû. Derî hêdîka vebûbû. Di wê tariyê de û tevî wê riya wî ya dirêj, Elî çawa ew nas kiribû, wî jî nizanîbû; ji wî jî nepirsîbû.
Eliyê Artîst, gava ko çav li hevalê xwe yê ko soza mirinê bi hev re dabû ket, mîna ko her derê wî qeşa girtibe, mat mabû. Qederekê tev jî neliviyabû. Hişê wî sekinîbû. Ji ber ko ji xew rabûbû, bawer nekiribû ko Robîn e. Gava hatibû ser hişê xwe jî ji bo ko kesek nebîne, hema zû bi zû ew kişandibû hundirê hewşê û derî girtibû.
Qet nepeyivîbûn. Ji ber ko nedixwast tu kes bi wan bihese, lempe jî

vênexistibûn. Di wê tariyê de, herdu jî bê deng li hember hevdu rûniştibûn û li nefesa hevdu guhdar kiribû. Bi xêra tariyê, wan ruyên xwe jî ji hevdu veşartibûn. Dû re, pîreka Elî hema zû bi zû nivînê Robîn danîbû û çûbû. Heta ko Eliyê Artîst rabûbû, hatibû cem Robîn û ew himbêz kiribû jî ji şûna xwe ranebûbûn. Robîn di himbêza wî de giriyabû. Elî pişta wî mist dabû û ew biribû ser nivînê wî, xistibû xewê. Sibê zû jî jê re av germ kiribû ko xwe bişo û riya xwe kur bike. Kincên nû jî anîbûn, li paş deriyê serşokê daliqandibûn.
Heta piştî taştê jî nepeyivîbûn. Bi dû re, Robîn bi dengê xwe yê westiyayî jê re gotibû, »ez ê tiştekî ji te bixwazim, Artîst.« Hê bi wî navî bangî wî dikir. Kêfa Elî hatibû bi vêya, dîmenên berê hatibû ber çavên wî, xemgîn bûbû û meraq jî kiribû bê Robîn çi dixwaze.
Robîn gotibû, »ji bo xatirê hevaltiya me, heta demekê ji kesî re nebêje ko te ez dîtime.« Serê Elî bi wê gotinê re ketibû ber. Lê, negotibû »çima«.
153
REŞ Û SPÎ

Nepirsîbû. Tevî ko hewil dabû ko wî fahm bike jî tu mahne nedabû wê xwasteka wî. Hema serê xwe bi mahneya ko bibêje »bila be,« hejandibû û
mabû. Heta Robîn beyî ko tiştekî din bibêje derketibû jî nepeyivîbûn. Gava Robîn ji mala Elî derket, bêhtir li jiyana wî fikirî. Ji xwe re malek ava kiribû. Zewicîbû. Heyata wî ketibû ser riya xwe û diçû. Lê ya wî? Yê wî, ew di refê qulingan de yekî nefîkirî bû û mehkûmî vê jiyana xwe bûbû ko êdî tu tahma wê nemabû...
Tew zewac, zarok û malbat...! Ew nikare xwe di wê rewşê de bifikire jî. Li ber deriyê girtîgehê, qelebalixa ko gelek caran bala herkesê ko di wira re dibihurî dikişand, tune bû. Qey ne roja hevdîtinê bû. Leşkerê

qamkinik ko bêvila wî ji serma sor bûbû, hingî Robîn ajotibû ser wî, hew di ber xwe de dabû û ji bo ko ji serleşkerê xwe bipirse, çûbû wê avahiya piçûk a ko bi qasî sed mitroyan ji derî dûr bû.
Piştî pênc-şeş deqîqeyan, bi leşkerekî din re xuya bû ko herdu destên xwe dabûn paş xwe û paçikeke sor bi milê wî yê çepê ve bû. Qama vî leşkerî ji yê din dirêjtir bû û qilafetekî wî yê girs jî hebû. Ne ji bêvila wî ya dirêj bûya, tew kes bi serê wî yê piçûk jî nedihisiya. Pir bi quretî dimeşiya. Leşkerê ko vê dawiyê hat, ji bo Robîn bitirsîne, bi awayekî hêrsbûyî awirin dan wî. Mîna ko li dijminê xwe binere û dike sixêfan bike, li wî diniherî. Digel ko ji çavên wî xuya dibû ko ew ne yekî ewqasî qure bû jî dixwast xwe weha nîşan bide.
Robîn bi psîkolojiya leşkerên weha baş dizanîbû. Ev leşkerên ko rutbeya wan piçûk bû, gava ko derdiketin hemberî xelkê û tew ko tu kesî din li ser serê wan nebûya, mîna ko hertişt ji wan dihat pirsîn tev digeriyan. Leşkerê ko quretî dikir, ji serî heta binî li Robîn niherî. Dû re, li leşkerê kêleka xwe zivirî. Leşkerê nobedar, li ber wî herdu destên xwe dabûn ber çîpên xwe, sînga xwe ber bi pêş ve rakiribû û sekinîbû. Ji bo ko qama wî hebekî dirêjtir xuya bibe, carê xwe radikir ser tiliyan jî.
— Ma yê ko dixwaze wî terorîstî bibîne, ev e?
Leşkerê qamkinik bi carekê ve bersiv dayê.
— Belê, Serleşkerê min!
Leşkerê qure diranên xwe şidandin û li Robîn zivirî.
— Min xelet nebihîst, ne weha? Tu dixwazî wî terorîstî bibînî.
Robîn fahm kir bê vî leşkerê ha dixwast çi bibêje, lê xwe li nezaniyê danî.
— Weleh, ez nizanim. Yê ko ez dixwazim wî bibînim, navê wî Şêxo ye.
154

Leşkerê qurê ji bo ko peyva wî bi ser ya Robîn bikeve û li ber leşkerê xwe nekeve rewşeke nebaş, xwe hêrs kir, dengê xwe bilind kir.
— Qeşmeriya neke, ûlen! Em dizanin bê tu behsa kîjan kûçikî dikî!
Kenê Robîn bi vê quretiya wî ya derewîn hat, bes nehişt ko kenê wî derkeve derve.
— Here roja sêşemê were! Îro, ne roja hevdudîtinê ye.
Robîn fahm kir ko heke li ber negere, nahêle têkeve hundir. Tam gava ko ew ê li dû xwe biziviriya, bi dengekî kubartir bangî wî kir.
— Serleşkerê min!
Leşkerê qure bi vê bangkirinê hebekî din pesinî û sînga xwe bilind kir. Vê carê, awirên wî ji yên berê nermtir bûbûn. Çavên wî diçirisîn. Bi wê kêfê, mîna zarokekî bû.
— Serleşkerê min, ez ji Stenbolê hatime vira. Ez li wira di şîrketekê de dixebitim û ji ber ko destûra min xelas dibe, divê ez vê êvarê bi rê ve bike-vim. Min bilêta xwe ya balafirê jî girtiye. Ez di bextê te de me, hela bê tu nikarî tiştekî bikî ji bo min.
Leşkerê qure dîsa bi awayê kesê hemberî xwe piçûk dibîne, li wî niherî. Bala xwe da kincên wî. Bi dû re li porê wî niherî, bala xwe da berçavka wî ya bêçarçove ko heqê wê pereyekî pir bû û ruyê wî yê xweşik û birqokî ko
qet nedişibiya yê Diyarbekiriyan.
— Weleh... ez nikarim tiştekî bikim. Lê, ez bala xwe didim te, tu naşibî wan kesên xerab. Çi têkîliya te bi vî kûçikî re heye?
— Ezbenî, ev deh salên min in ko ez li Stenbolê mim. Gava min li heval mevalên xwe yên mektebê pirsî, ez hîn bûm ko Şêxo li vira ye, min jî got hema ez seriyekî bidim wî. Ketibe ser rêyeke xerab û cahiliyek kiribe jî hêvalê mirov e. Weke hûn jî dizanin, mirov nikare hêvalên xwe yên berê nebîne û here.

Leşkerê ko bala xwe dabû tirkiya Robîn a kubar û delal, destekî xwe bir jêra lêva xwe, çenga xwe hebekî xwirand û sekinî.
Bi dû re got:
— Baş e. De hela ka tu bisekine. Ez ji serleşkerê xwe re jî bibêjim. Heke bihêle, belkî ez ê bikaribim te ji bo demeke kurt berdim.
Robîn tavilê ji bo nermkirina wî, hewildaneke din kir.
— Ez ê mînetdarê te bim, ezbenî.
Leşkerê qure, yê nobedar li wira hişt û çû dîsa ket hundir. Piştî deh deqîqeyan, dîsa xuya bû. Gava ko ji hundir derket, herdu destên wî li ber çîpên wî bûn û bi paş ve derketibû, lê bi dû re gava ko berê xwe da wan,

dîsa destên xwe danîn paş xwe, sînga xwe rakir û dîsa bû qureyê berê. Bi gavin giran ber bi derî ve hat.
Ji bo ko derî li Robîn veke, bi destekî xwe işaretek da leşkerê nobedar.
Robîn nasnameya xwe da destê leşkerê nobedar û alav malavên ko dikare xeter ji wan çêbibe jî li hundirê qulûbeya wî danîn. Wê gavê, dengê leşkerê qure hat bihîstin:
— Bi tenê, ji bo deh deqîqeyan, ha! Tu careke din jî neyê ziyareta vî dêqahpî.
Robîn bi wê peyva wî ya dawiyê, hebekî hêrs bûbû jî dengê xwe nekir.
Gava di ber wî re bihurî, destê xwe yê rastê danî ser sînga xwe û got:
— Spas, ezbenî. Xwedê ji we razî be.
Robîn da pey leşkerê nobedar î kinik û ber bi avahiyên mezin ko dixana reş bi ser serê wan ketibû, meşiyan. Li pey leşkerê nobedar dimeşiya û carê bala xwe dida hewşa girtîgehê jî. Leşkerê qure ko hê di pey wan re diniherî, di bin simbêlan re dikeniya û serê xwe kil dikir.

Ev avahî ko hingî kevin bûbûn, mirov digot qey dê bi derbekê hilweşin. Cihê ko mehkûm lê diman jî ev der bû. Li dora wan, li ser dîwarên bilind, qulûbeyên nobedaran hebûn. Li rasta qulûbeyan, ser dîwaran, seranser bi
têlan hatibûn bilindkirin.
Ev girtîgeha navdar ko gelek girtiyên bi nav û deng lê mabûn û ji ber vê xusûsiyeta xwe bûbû mijara gelek pirtûkan, tirseke mezin dixist dilê mirovê ko di ber re dibihurî. Bayê cemidî ruyê mirov wek ko gwîzan lê ketibe, diêşand. Ji ber wê bêdengiya doraliyê, girtîgehê mîna avahiyeke ko tu kes bi ser de nayê û bêxwedî mabû xuya dikir.
Gava gihaştin ber avahiyeke ji wan avahiyên mezin, berê, çavên wî bi nivîsa ko li ser derî hatibû daliqandin ket. Li ser wê avahiya kevin mîna pîneyekî xuya dibû. Li ser tabelayeke nû û reş ko dibiriqand, bi nivîseke mezin û zer hatibû nivîsandin:
»Ne Mutlu Türküm Diyene«
Di bin wî deriyî re derbas bûn û ketin hundir. Herduyan li qorîdorê, berê xwe da odeyeke piçûk. Leşkerê qamkinik nasnameya Robîn da zilamekî sivîl î simbelboq û tiştin di guhê wî de gotin. Yê sivîl di bin çavan re li Robîn niherî, mahdê xwe tirş kir û jê re got:
— Derkeve û li ber derî bisekine!
Piştî gavekê, zilamê simbêlboq derket. Bi awirin tûj dîsa li Robîn niherî û lêva xwe xwar kir. Robîn bi wî û awirên wî yên xerab hisiyabû, lê mîna ko hayê wî ji tiştekî nebe, ji xwe re li dora xwe diniherî. Zilêm di ber xwe
156

de kir niçe niç û meşiya. Ket neqebekê û wenda bû. Dengên lingan, mifteyan, deriyan, însanan bi dû hev re hatin bihîstin.
Leşkerê qamkinik hat cem Robîn û ew bi xwe re bir odeyeke din. Ode

bi hesinên ko ber bi jorê ve bilind dibûn û nedihiştin mirov derbasî aliyê din bibin, bûbû du beş. Li herdu aliyên hesin jî herkê kursiyek hatibû danîn. Aliyê din, ji aliyê ko Robîn lê bû firehtir xuya dikir. Deriyekî din jî di wira de hatibû vekirin. Wê gavê, Robîn têgihişt ko ew ê Şêxo di wê derê re bînin.
Leşker çû pişta xwe da dîwêr û sekinî. Robîn destûr jê xwast û çixareyek ji bêrîka xwe derxist. Guhê xwe da aliyê din, lê tu deng ji wî alî nedihat. Çixareya xwe xelas kir û di pencereya kêleka xwe re avêt derve. Bîstikekê li derve niherî. Berfê hêdî hêdî dest pê kiribû. Piştî ko bala xwe hebekî dayê, bi berfê re xemeke giran xwe li dilê wî girt.
Niha, mîna ko li filîmekî kevin temaşe bike, dihat bîra wî. Ew di zarokatiya xwe de, her gava ko berf dibariya, bi kêf û bi heyecan direviya derve û xwe li ser erda berflêgirtî diavêt erdê. Kîjan nasê wî di wira re der-
bas bibûya, bi topikên berfê êrîşî wan dikir. Ji ber ko berf hercar ned-
ibariya, çi lîstikên li ser berfê bihatana bîrê, giş di carekê de dilîstin. Bûka berfê çê dikir, wî û zarokên cîranan li ser berfê bi topê dilîst. Derdiketin ser dîwaran û xwe diavêt ser berfê. Di nav berfê de dimeşiyan. Tew berfdimsk bi tu tiştî nedida.
Leşkerê ko pişta xwe dabû dîwêr û li wî diniherî, fahm kir bê Robîn di wê berfê de çi dibîne. Li ser tûtikan rûnişt û bala xwe dayê. Heta ko dengê lingan ji wî aliyê hesinan nehat jî ranebû ser xwe û xwe rast nekir.
Bi dengê lingên ko di qorîdorê de olan dida, Robîn jî li xwe zivirîbû. Ji xwe, wê dîmena berfê ew biribû bîranînên zarokatiya wî û kiribû ko kela girî têkeve qirika wî. Gava ko deng hatibûyê, êdî çongên wî sist bûbûn û bi zorê xwe gihandibû heta ber hesinan.
Ne dengê lingên kesekî bi tenê bû. Xuya bû ko du kes dihatin. Lê kesên ko dihatin, hêdî hêdî dimeşiyan. Dengê lingan kêm kêm dihat û carê jî

dihat birîn. Deriyê hesinî ko li aliyê din bû, vebû. Piştî gavekê, zilamê simbêlboq di bin çengê yekî din de xuya bû û ew ber bi hesinan ve anî. Hê du-sê gav mabûn ji hesinan re, Şêxo sekinî û li Robîn niherî. Zilamê simbêlboq ew hişt û bi paş de vekişiya. Wî jî weke yê leşker, xwe da ber dîwêr û bala xwe da wan.
Robîn dikira ew nas nekiraya. Herçî Şêxo bû, berê ne ewqasî zeîf bû, lê niha mîna kalên heftêsalî, pişta wî xûz bûbû û bi zorê dimeşiya. Porê wî

jî tev de weşiyabû.
Berî ko Robîn bi malbata xwe re here Stenbolê, bi qasî pênc salan hevaltî bi hevdu re kiribû. Di wê maweyê de, gelek tişt bi hevdu re kiribûn. Ji bo hevdu gelek caran ketibûn nava şerên mezin û zilam jî birîn kiribûn. Mirov digot qey navika wan bi hevdu re hatibû birîn. Her bi hev re bûn. Li Diyarbekira ko tirsê ew dagir kiribû, wan cesaret ji hevdu werdigirt û bi hevdu re bi mêrxasî li hember xezeba tirsê radiwestiyan. Bi stranên xwe, bi govendên xwe, bi pêywendiyên xwe û bi evînên xwe, ne li qedexeyan guhdarî dikir û ne jî tu sînor nas dikirin. Ew wê demê, bi baweriya xwe ya bi hevdu, bi misteweya xwe ya têgihîştinê û bi wêrekbûna xwe ji bo gelek xortan nimûne bûn.
Gava ko herdu bi hevdu re bûna û tew Selman û Elî jî li kêleka wan bûna, tu kesî newêrîbû derketaya ser riya wan. Herkesî ew baş nas dikirin. Şêxo ji destê xwe re pir baş bû. Robîn jî ne kêmî wî bû. Ew jî bi desthilanîn bû. Herkesî bi vêya dizanîbû.
Piştî kuştina Seydo, wî û Şêxo û Selman bi hevdu re biryar dabû ko jiyana bajêr terk bikin. Lê hê wan xwe baş amade nekiribû, Resûl Beg nexweş ketibû. Wê gavê, Robîn ji mecbûrî biryara xwe guhertibû û li ba-

jêr mabû. Ji bo ko ew ji biryara xwe vegeriyabû, yên din jî neçûbûn. Giş bi carekê ve hatin ber çavên wan û bihurîn. Wê demê, hemû derdên xwe ji hevdu re digotin. Carinan, gava ko wan hew dikarîbû li hember bitenêtiya êvarên ko tu kesî newerîbû derketaya derve debar biki-
raya, serên xwe datanîn ser milên hevdu û digiriyan. Gava ko yek ji wan nexweş diket, yê din heta sibehê li ber serê wî rûdinişt û ji bo ko tişt bi hevalê wî neyê, tevî ko bawer nedikir jî dia dikir. Dihat gotin ko tu hevaltiya di ser ya wan re heram e. Heta mirinê jî dilên wan dê bi hevdu re bûna.
Gava ko Robîn wê şeva dawiyê xatir ji wî xwastibû, herduyan hevdu himbêz kiribû û bi hevdu re sûnd xwaribû.
— Em tu carî hevdu ji bîr nakin. Heta mirinê... Çi bibe jî...
Şêxo, çer ko çav li Robîn ket, hêdîka pişta xwe rast kir û sekinî. Nedixwast ko di wê rewşa xerab de derketaya hemberî destbirakê xwe yê
mirinê, lê belê...
Destên xwe dirêj kirin û xwe bi hesinan ve girt. Çavên wî yên ko kerba salan tê de diyar dibû, bi hesreta salan ji nişka ve tije hêsir bûbûn, sor bûbûn û hêsir ji bo herikandinê li hemanan bûn. Di nav hesinan re bi destên hevdu girt û mist dan.
158

Şêxoyê ko gava hatibû girtin sal û nîvekê di îşkenceyê de mabû û ne-
gotibû ay jî li ber vê hevdudîtina ko wî qet hêvî nedikir û ji nişka ve pêk hatibû, hew xwe li ser lingan zevt kir û hêdîka xwarî erdê bû, li ser çongên xwe sekinî. Robîn jî bi wî re xwe bera jêrê da.
Destên wan di nav hev de, bi çavên westiyayî ko dixwazin gelek tiştan

ji hevdu re bibêjin, li hev diniherî. Şêxo, ji bo ko negirî, lêva xwe gez kiribû. Robîn lê hay bû ko Şêxo destê wî dieciqîne. Wê gavê, fahm kir ko hevalê wî ji ser hişê xwe ve çûye û ji bo ko negirî, xwe dişidîne.
Şêxo hew xwe girt, lêva wî hêdîka ricifî. Hêsirên çavan xwe hêdî hêdî bera jêrê da. Dû re, serê xwe bera ber xwe da û bû kûr kûra wî...
Digel ko Robîn xwe ji berê de, ji bo vê rewşê amade kiribû û ji xwe re gotibû »ez nagirîm«, niha ew jî digiriya. Lê, dil li tu emiran guhdarî nedikir. Ew filîmê kevin dîsa hat ber çavên wî. Hemû demên ko ew bi hevdu re jiyabûn... Kêf... henek... lîsk... şer... xeyalkirina tiştên nedîtî... evînên nîvcomayî... girî... hesret...
Wê gavê, hînî tiştekî din jî dibû. Dû re, wî ê ev tiştê nû, di helbesteke xwe de binivîsandaya û her ko wî ew helbest bixwenda jî ew ê ji nû ve biçûya wan rojan û bigiriya:
»her tişt, di dema xwe de tête jiyîn,
bes di hişê mirov de dimînin hemû bîranîn
tu tişt bi şûn de venagere... »
Xwast ko bipeyive, bes mejî hew dixebitî. Li ruyê hevalê xwe niherî. Mîna ko bixwaze wî himbêz bike, lê niherî. Hêsir ji çavên wî diniqutîn xwarê. Peyv bi zorê anîn ser hev. Carê jî disekinî û bêvila xwe dikişand. Ma ge-lo gava mirov hevalekî xwe yê bi vî rengî dibîne, dikare çi bibêje?
Şêxo... Hevalê heta mirinê. Niha, çi qasî belengaz û neçar mabe, ew çend jî xurt û bixwebawer bû. Bes xuya bû ko pir dilşikestî bû. Kerba salan û rewşa wî ya xirab ko dest û lingên wî girê dabûn, dikarîbû di ruyê wî yê bikeser û çavên wî yên xembar de bihataya dîtin. Mîna ko ji şerekî mezin derketibe. Birîndar. Têkçûyî. Westiyayî. Dilşikestî... Dilê mirov bi wî dişewitî.
Piştî bêdengiyeke ko herdu jî birin wan rojên berê û serên wan li hem-ber vê rewşê ji neçarî tewandin, Robîn bi dengê xwe yê westiyayî û ler-

zokî, got:
— Ez... ez hatim sûnda xwe nû bikim, Şêxo... Tu jî heyî?..
159
REŞ Û SPÎ

6. Here ji vira...
Gava nasnameya xwe ji destê leşkerê qamkinik girt, çavên wî dîsa dageriyan ser wan avahiyên ko niha di ber re bihurîbû. Kîn û kerba dilê wî, xwe ji ruyê wî û niherînên wî dida der. Hêrsa wî bêhna wî diçikand û dihişt. Şêxoyê ko bûbû nîvînsan, Şêxoyê ko berê xurtê xurtan bû...
Dilê yê leşker jî bi wan şewitîbû. Gava herduyan li hundir wê odeka ko bi hesinan bûbû du beş, destên xwe di nava wan hesinan re dirêjî hevdu kiribûn û mist dabûn, mîna ko agirek bi dilê wî jî bikeve, ji nişka ve janekê xwe li sînga wî girtibû û wî wê gavê berê xwe dabû alî, debar nekiribû ko li wan temaşe bike. Ji lewre, rewşa wan fahm kiribû. Mîna ko Robîn nexweşekî li ber mirinê be û bixwaze alîkariyê bi wî bike, bi kubarî kaxizên wî dabûn wî. Heta ko çûbû jî ji paş deriyê hesinî lê niherîbû. Serê xwe bi mahneya ko bibêje »erê...« bi kerb hejandibû.
Robîn di tevliheviya hisên yekî ko di şerekî hebûn û nebûnê de têkçûyî û hertiştê xwe wendakirî de, serî di ber de dimeşiya. Hêsirên wî hê zuha nebûbûn. Dilê xwe hîn jî li girî rehet nekiribû. Ne bayê li derve xema wî bû, ne jî sola wî ya ko di nav heriyê de mabû. Beyî hayê xwe, dabû nav heriyê û dimeşiya. Tew carinan, mîna ko ji xwe re bi tiştekî bilîze, lingê xwe li çiravê jî dixist. Ne li ser hişê xwe bû. Digiriya.
Êdî hertişt ji xweber zelal dibûn. Zaroktî, hevalbendî, evîndarî... Hertişt çûbûn. Di şûna wan de, êdî tu tişt nemabû. Bes keser... Bes kerb... Û ruyê hin hevalên berê. Selman, Hemdîn, Elî... Di ser gişan re jî rewşa Şêxo dê her di bîra wî de bimaya û tu carî jî ji ber çavên wî neçûya.

Ma gava mirov hevalekî xwe yê bi vî rengî di rewşeka weha de bidîtaya, dikarîbû li çi bifikiriya gelo?...
Seqema mîna ko gwîzanekî tûj li ruyê mirov bixe, ruyê wî kiribû mîna qalibekî qeşayê. Bêvila wî sor bûbû. Diherikî. Wî hay ji xwe tune bû. Heta ko ew teqsiya ko hindik mabû li bin guhê wî bixe, bi frênekê li ser erda qeşagirtî çerixî û bi dijwarî li ber wî sekinî jî li xwe hay nebûbû. Şifêrê teqsiyê yê qilafetgirs û simbêlboq ko pir hêrs bûbû û ji heyecan û tirsa xwe sor bûbû, gava ko daket û ji bo ko derbeke mezin li nav çavên wî bixe ber bi wî ve çeng bû, Robîn serê xwe rakir û bi awirekî nerm lê ni-herî. Şifêrê ko ew nas kir, wê gavê veciniqî û li ber sekinî.
Devê wî bi zorê digeriya:
— Tu ketiyî çi halî! Ka were têkeve mekînê.
Ji nişka ve, ew hêrsa wî mîna avekê herikîbû û çûbû. Şifêrê ko bîstika
160

din, ji bo ko li wî bixe, bi hêrseke mezin ji mekîneya xwe daketibû, niha bi hezkirina ko bi tenê dayikek dikare nîşanî zaroka xwe bide, bi awirên ecêbmayî li wî diniherî.
Robîn dîsa serê xwe bera ber xwe da û berê xwe da alî. Meşiya û çû. Zilêm teqsiya xwe hişt û da dû wî. Di pey wî re ket kuçeyê. Hê digot ko ez ê xwe bigihînimê, di şûna xwe de sekinî û mat ma. Hema bi şûn de vegeriya û bi lez xwe veşart.
Du zilamên qilafetgirs û birîh, bi qirika Robîn girtibû û pişta wî dabû dîwêr. Yekî ji ber xwe devançeya xwe derxistibû û xistibû cênîka wî. Yê din jî bi lezandineke ecêb, carê serê xwe radikir, li dora xwe jî diniherî û li bêrîk mêrîkên wî digeriya. Gava dev ji wî karê xwe berda, bi situyê wî girt û da pêşiya xwe û ber bi teqsiya xwe ya ko li serê kuçeyê hatibû sek-inandin ve çûn.

Robîn di ser milê xwe re zivirî û li aliyê zilamê ko xwe di paş dîwêr de veşartibû û serê xwe derxistibû niherî. Çavên wan carekê li hev ketin. Du zilaman Robîn dibir. Mêrik ji wê neçariya xwe fedî kir. Serê xwe da dîwêr û ji hêrsan lêva xwe gez kir.
Herdu zilaman Robîn di nav xwe de da rûniştkirin û teqsiya wan bi rê ve ket. Zilamê esmer ko bîstika din devançeya xwe xistibû serê wî, ji bo ko Robîn li dora xwe nenere, hişk bi situyê wî girt, eciqand û serê wî daxist jêrê. Canê Robîn ji ber vê hereketa wî êşiya. Tiliyên wî yên şidiyayî, dikira situyê wî qul bikira. Robîn naliya.
— Xwe tev nelivîne, kuro!
Robîn sekinî. Ditirsiya. Lê rewş fahm kiribû. Ji xwe, gava ko li ber deriyê hefsê bû, ji ber ko baş bi rewşa vî bajarî dizanîbû, texmîn kiribû ko dê tiştekî weha were serê wî. Beyî ko bizanibe bê ka wî bi kû de dibin, serê
wî li jêrê, di situyê wî de tiliyên zilamekî esmer î xurt î nenas, difikirî. Hertiştên ko pê dizanîbû, di ber çavên wî re bihurîn. Diyarbekir hê weke berê bû, nehatibû guhertin.
Mekîne piştî rêyeke dirêj û rast, da ser rêyeke şose. Carê, li kortik mortikan diket û diçû. Ji dengê motora teqsiyê pê ve, tu deng nedihat bihîstin. Xuya bû ko ji nava bajêr derketibûn. Zilamê din ko ew jî li kêleka wî rûniştibû, berçavka wî derxist û xist bêrîka xwe. Ji bêrîka xwe ya din paçikekî reş derxist û ji nişka ve da ber çavên Robîn û girê da.
Robîn got qey hin wî difetisînin. Zilamê ko çavên wî girê dabûn, herdu destên wî ji paşiyê ve kelepçe kirin. Wê gavê, tirsa Robîn zêdetir bû. Qurbanên li ber destê qesabekî ko di destê wî de satore û kêr hebûn hat
161
REŞ Û SPÎ

bîra wî. Ew beranê dest û lingên wî hişk zevtkirî û çavên wî girtî ko qesêb dê ji nişka ve kêr bidaya qirika wî, çi qasî hewil bidaya xwe jî dê ji sêr-jêkirinê xelas nebûya.
Xwe eynî şiband wî beranê ko ji neçarî, dev ji hewildana xwe ya xelas-bûnê berdaye û xwe daye benda mirinê. Dilê wî him bi wî beranî him jî bi wî şewitî. Hertişt li dû wî dima. Mirov di rewşeke weha de, tu carî nikare li xelasiyê bifikire. Hema dixwaze zû bi zû bimire. Wê gavê, li her-tiştê xwe poşman dibe. Êdî, heke wî nekujin jî ew ê ji ber wê tirsê ji xwe-ber bibe nîvzilam. Zilamekî ko têkeve vê rewşê, heke xelas bibe jî jiyan lê diherime. Piştî vê xelasiya ko têkçûyina herî mezin bû, dê tu mêrantî jî bi wî re nemaya.
Rojekê, yekî jê re behsa kuştina zilamekî kiribû û gotibû ko gelek kes bi vî awayî hatine kuştin. Hinan ew digirtin û dibirin. Tu xeber ji wan dernediket. Kesî nizanîbû bê çi hatiye serê wan; kê ew kuştine. Lê gişan dizanîbû ko ev zilam hemû, ji ber eynî tiştî têne kuştin.
Niha, ew jî yek ji wan kesan bû ko ber bi rêya mirinê ve diçûn. Gelo ew jî ketibûn vê rewşê? Çavên wan jî hatibûn girêdan? Destên wan jî ji paşiyê ve hatibûn kelepçekirin? Ew jî mîna wî li kesên berî xwe fikirîbûn? Gelo ew jî bi qasî wî weha tirsiyabûn?
Serpêhatiyên li ser kuştina wan kesan dihatin gotin, yek bi yek hatin bîra wî. Digel ko wî tu carî tiştekî weha nedîtibû û lê nefikirîbû jî mîna ko ew zilam li ber çavên wî hatibin kuştin, giş hatin bîra wî. Tirsiya. Pir tirsiya. Nedixwast bifikire, lê qedera wî û ya wan kesên ko bi vî rengî hat-ibûn kuştin, ber bi hev ve diçû. Wê çaxê, wech pê re nema. Êdî nema dikarîbû li tiştekî bifikiriya. Ji tirsan, bûbû sipiya firkandî.
Xwast ko bigirî. Xwezî aniha rabûya û bidîtaya ko ev tişt giş xewn in. Nedixwast bawer bike, lê ev tiştên ko bi serê wî de hatibûn, tev de rast bûn.

Leza teqsiyê hêdî hêdî kêm bû û sekinî. Zilamê ko ji paş situyê wî ve ew zevt kiribû, tiliyên xwe sist kirin û ew rakir. Robînê çavgirtî ko dixwast di bin reşahiya wî paçikî re ber xwe bibîne, lê ev hewildana wî jî bi kêrî dît-inê nedihat, bi dengê zilamê ko çavê wî girê dabûn li xwe zivirî.
— Tu çixarê dikşînî?
Zilêm pakêta xwe dirêjî wî kiribû. Robîn bi vêya dizanîbû. Lê belê, wî bersiv nedayê. Zilêm jî guh nedayê û dîsa pakêta xwe xist bêrîka xwe.
— Tu dizanî bê me ji bo çi tu aniyî, ne weha?
Robîn dîsa nepeyivî. Zilêm çixareya xwe pêxist û gulpek jê kişand.
162

Bêhna çixareya wî çû Robîn jî.
— Belê, Robîn. Heke tu ê weha bikî, em ê vî karî qet nekin û te li vira daxin jêrê.
Zilêm bi navê wî bangî wî kiribû. Heke weha be, bi hertiştên wî dizanîbû. Belkî bi rastî jî xewn be. Belkî yek ji wan kabûsên wî be jî. Lê, le ko ne weha be; le ko bi rastî jî aniha di nav du zilamên ko niha tu kesî nikarîbû bi qasî wan tirs bera dilê mirov bidaya û li benda mirinê rûniştibe.
Bêtir tirsiya. Êdî, wan ê ew bikuştaya. Hayê wan ji tirsa ko niha Robîn tê de bû hebû. Ji xwe, ew jî ji xwe re li yekî mîna Robîn digeriyan ko kê-fa xwe pê bînin.
— Tu ê bipeyivî, ne weha, Robîn?
Dîsa eynî zilamî pirsîbû. Ji dengê wî xuya bû ko bi xwe bawer bû. Hertişt di dest wî de bû. Û ji awayê peyva wî jî mirov dikarîbû têbigihiş-taya ko dikin xezebekê bînin serê wî. Lê mirov digot qey heke Robîn bi wan re bipeyive, belkî tiştekî bi wî nekin. Ji ber ko gava mirov di vê rewşê de be, mirov ewqasî qels dibe ko carinan ji ber vê qelsbûnê, dikare baw-

eriyê bi dijminê xwe jî bîne. Ji ber ko tu hêviya mirov namîne... Ji ber ko ditirse...
Robîn jî ditirsiya. Pir ditirsiya. Ditirsiya ko ev zilamên ko kî dizane bê bûne qesasên çend kesên din jî wî daxin jêrê û wî bidin ber guleyan û meytê wî li vê çolê bihêlin. Li xwe fikirî. Di nav wê seqemê de, çavgirtî, dest ji paşiyê ve kelepçekirî û mirî... Dîsa fikirî. Ew ê bibûya termek. Çare tune bû. Li gora ko ji mezinan bihîstibû, nan û ava wî dê bi vî awayî ji vê dinyayê hilataya. Fikirên wî ew bêtir tirsand.
Tevzînokên cemidî bi pişta wî û cênîkên wî ketin.
Robîn nedipeyivî. Di ber xwe de dida.
— Baş e. Îja, yanî tu ji me re nabêjî bê ka tu ji bo çi hatiyî Diyarbekirê, ne weha?
Robîn dîsa tiştek negot. Mîna ko tiştek ji devê wî fahm nekiribe. Lê Robîn digot qey aniha, yek ji van zilaman dê bibêje peleq û derbekê li ser çavê wî bixe.
Dengê şeq şeqekê hatê. Veciniqî, lê xwe zû da ser hev. Yekî cercûr dix-ist devançeya xwe. Robîn ev deng pir baş nas dikir. Bes rojekê yekî jê re gotibû ko gava ev mirovan dibin, ji bo ko wan bitirsinîn çi li ser navê kuştinê hebe, dikin; lê wî nakujin. Ev peyveke xweş bû û dilê mirov rehet dikir. Lê dîsa jî baweriya mirov hercar bi peyvên weha nayê. Ji ber ko heta

niha, meytên gelek kesên ko bi vî awayî hatibûn kuştin, piştî çend rojan li ser riyên derveyî bajêr hatibûn dîtin.
Dengekî din hat wî ko ji yê bîstika din bêtir tirs xist dilê wî. Şerqîniyeke din hatê. Careke din jî vecinîqî. Yekî fîşek diajot ber devê devançeya xwe. Ew peyva bîstika din ko digot; mirovan ditirsînin, dîsa hat bîra wî; lê êdî

mîna wî beranî, baş bawer kiribû ko ew ê bê kuştin. Laşê wî bi temamî diricifî.
Zilaman her rê diceribandin. Wan jî dizanîbû ko êdî Robîn tirsiyaye.
Zilamê bîstika din, dîsa bi awayekî bixwebawer û mîna ko henekên xwe pê dike, pirsî:
— Tu ê bersivê bidî me, yan em te daxin, Robîn?
Yê din, yê esmer peyivî vê carê:
— Na lo, ev napeyive. Tu belasebeb serê xwe pê re diêşînî. Em wî daxin û bikujin. Ma ji bo çi em ewqasî li ber digerin? Xuya ye, ev pir qure ye. Em wî jî mîna yê din bikin.
Yê din?! Ev kî bû gelo?
Meraqek ket dilê wî. Ev çend roj bûn ko rojname jî nexwendibû. Heke xwendibûya, wî ê bizanîbûya bê ev derew e, an na. Lê îhtimaleke mezin hebû ko dîsa ji bo wî bitirsînin weha dipeyivîn. Dîsa jî guman ket dilê wî. Le ko bi rastî jî yekî din hebe? Tavilê Bişar hat bîra wî. Veciniqî.
Zilamê din got:
— Na na. Robîn ê bipeyive. Tu wê silehê deyne, hela. Hê wexta wê nehatiye.
Gava ko navê silehê ji devê wî derketibû, dengê xwe hebekî bilind kiribû. Dû re, li Robîn zivirî û dengê xwe dîsa guhert, bi awayê xwe yê bîstika din, got:
— Tu ê me mecbûrî kuştina xwe nekî, ne weha Robîn? Binere, tu dişibî kesekî xwende. Ez naxwazim tu ji ber tiştekî belasebeb bê kuştin. Tiştê ko em ji te dipirsin, ne tiştekî zor e. Bi tenê ji me re bibêje bê tu ji bo çi hatiye vira?
Ma gelo vî zilamî bi rastî jî başiya wî dixwast? Le zilamê din? Wî çima dixwast hema zû bi zû wî bikuje. Gelo bi rastî jî dixwast wî bitirsînin?
Li benda wî sekinîbûn. Lê, Robîn nedipeyivî. Serê wî di ber wî de bû.

Piştî ko hebekî din jî sekinîn, zilamê din dîsa bi gazind ji hevalê xwe re got:
— De dev jê berde, lo! Ka tu wî ji min re bihêle, hela.
Vê carê, deng ji yê din derneket. Deriyê aliyê rastê vebû û zilamê ko
164

sileha xwe xistibû destê xwe daket. Bi vekirina derî re, bayekî cemidî hat hundir. Robîn vê carê, ji hercar bêtir tirsiya. Zilamê ko daketibû, xwe dirêjî wî kir û ew ji nişka ve kişand derve. Serê wî li derî ket. Li ber derî ket erdê. Xwast ko destê xwe bigihîne serê xwe; lê, lê hay bû ko destê wî ji paşiyê de kelepçekirî ne. Cihê ko li derî ketibû, pir êşiyabû. Tiştekî germ ji eniya wî herikî ser çavên wî. Li erdê ma. Zilêm bi qirika wî girt û ew ji erdê rakir û di pey xwe re kişand, bir pêşiya teqsiyê.
Wexta mirinê hatibû. Ji niha de, dihat ber çavên wî. Zilêm ew da rûniştkirin û devançeya xwe xist paş situyê wî.
Mejiyê wî sekinîbû. Hew dikarîbû bifikiriya. Xwezî aniha, hin mirov di rê re derbas bibûna, yan jî hinan bihataya û ew xelas bikiraya.
Teqsî şixulî. Dengê motora wê di ber guhê Robîn de bû. Mekîne ned-imeşiya, lê şifêr hey pê li xazê dikir. Dikira şanzûmana wê biteqiya û perçe perçe bibûya.
Zilêm dîsa bi situyê wî girt û devançe di paş situyê wî de eciqand. Qêriya:
— Tu ê bipeyivî, an na? Ha? Tu ê bipeyivî?
Mirov ji dengê wî ditirsiya. Sileha xwe jî di canê wî de radikir.
Robîn bûbû mîna pepûkekî. Deng jê dernediket. Diricifî. Him ji tir-san, him jî ji ber bayê cemidî. Bûbû beranê li ber kêran. Çav girtî. Dest li paş kelepçekirî.
Zilam diqêriya:

— Tu ê bipeyivî, ûlen? Bibêje! Bibêjeeeeee...!
Şifêrê teqsiyê hey pê li xazê dikir. Zilam diqêriya. Bayê cemidî dihat. Canê wî pûç bûbû. Diricifî.
— Bipeyive, ûlen! Bipeyiveeeeee...!
Di nav wê tevliheviyê de, dengê teqînekê hat, li der û dorê olan da û tev li dengê bê bû.
Dilê Robîn dikira bisekiniya. Got qey gule bera serê wî daye.
Zilam dîsa qêriya:
— Heke tu nepeyivî, ez ê ya duyem bera serê te bidim! Bipeyive!
Dengê deriyê teqsiyê hat. Yek bi bazdan hat û bi zilamê din girt.
— Dev jê berde! Temam! Bes e, êdî!
— Min berde! Min berde, ez ê wî bikujim! Ez ê bikutim diya wî eynî!
Zilamê din ew dehf da.
— Bisekine, hela. Belkî lawik bipeyive.
Yê din hê sixêf dikir. Pir hêrs bûbû. Zilamê ko vê dawiyê hatibû, bi ser
165
REŞ Û SPÎ

Robîn de daqul bû.
Robîn digiriya. Diricifî. Paçikê li ber çavên wî, ji xwîna ko ji eniya wî diherikî û hêsiran şil bûbû.
Zilêm ew rakir û paçik vekir. Bi wî paçikî xwîna eniya wî paqij kir.
— Ka were hundirê mekîneyê. Tu cemidiyî.
Ew xist hundirê mekîneyê û li kêleka wî rûnişt. Yê din jî kete hundir û derî girt. Lê, berê xwe neda aliyê wan. Di pencereyê re li derve diniherî. Xwe da benda wan.
Robîn di umrê xwe de, tu carî ewqasî netirsiyabû. Belkî vê bûyera ha bikira ko dîn jî bibe. Li tiştekî weha nefikirîbû. Heke di serî de,

bizanîbûya ko ew ê ewqasî bitirse, belkî wî ew qet neşitexilandana û bersi-
va pirsên wan bidaya jî.
Zilêm got:
— Min nedixwast tu têkevî vê rewşê, Robîn. Lê hevalê min wezîfa xwe dike.
Sekinî. Destê xwe li milê şifêr xist. Mekîne zivirî û da ser riya ko tê re hatibû.
Robîn dîsa tiştek negotibû. Piştî ko demeke dirêj giriya, bêhna wî hat ber. Serî di ber de, pirsî. Ji ber ko fedî dikir li ruyê zilêm biniheriya. Nedixwast kes bibîne ko digirî. Dijminê wî be jî...
— Hûn çi ji min dixwazin? Ma min çi kiriye?
Bêhna zilêm jî hatibû ber. Kêfa wî hatibû. Bi ser ketibûn. Robîn peyivîbû.
— Te tiştek nekiriye, Robîn. Em dixwazin hîn bibin bê ka tu ji bo çi hatiyî vira?
— Ma qey qedexe ye ko mirov vegere warê xwe?
Demekê kes nepeyivî ji wan. Robîn di ber xwe de diponijî. Belkî poş-
man bûbû ko hatibû vira, belkî jî ji ber ko li îhtîmala pêkhatina bûyerin weha nefikirîbû û biryara hatinê dabû, niha ewqasî li ber diket. Lê, tiştek bi tenê di ruyê wî de xuya dibû: Tirs... Tirseke weha bû ko mirov dikarîbû ji ber wê lal jî bibûya, velîstaya jî. Hema bimiraya, ji wî re çêtir bû.
Zilamê ko ew ji mirinê xelas kiribû, yan jî wî digot qey weha bû, destekî xwe da ser milê wî û mîna ko bi hevalekî xwe re bipeyive û bixwaze rêyeke baş bi ber wî bixe, şîreteke başiyê li wî bike, bi dengekî nerm ko mirov nikarîbû şikê ji samîmiyeta wî bike, got:
— Bala xwe bide min, Robîn. Heke em bihêlin tu li vira bimînî, nabe.

Ev der ne li gora te ye. Baş bifikire.
Got:
— Ma mirov dikare li bajarekî mîna Diyarbekirê çi bike? Here Robîn, here. Ji te re du roj muhlet. Vegere, here Stenbolê. Kesekî te li vira nîne. Ez ji bo te dibêjim. Serê xwe nexe belayê û here.
Bi dû re jî got:
— Du roj bi şûn de, heke em te bibînin... vê carê ez nikarim ji bo te tiştekî bikim.
Ketin nava bajêr. Serê Robîn di ber wî de bû. Teqsî ket ser riya sûkê. Lê berî ko têkeve nav sûkê, sekinî. Deriyê aliyê rastê vebû û zilamê ko dixwast wî bikuje daket. Piştî ko Robîn daket, dîsa siwar bû û teqsiyê berê xwe da aliyê sûkê.
Robîn weke mirovê ko nû ji şikenceyê derketibe, situxwar, bê hal, westiyayî... Tiştê ko hatibû serê wî, ji xwe şikenceya herî mezin bû. Serê wî hingî diêşiya, dikira biteqiya. Ruyê wî zer bûbû. Biniya çavên wî reş bûbû. Eniya wî ya ko li deriyê teqsiyê ketibû şîn bûbû û diêşiya. Çongên wî sist bûbûn. Nikarîbû bimeşiya. Hema li kêleka riyê, li ser kevirekî rûnişt. Çavên xwe bi tirs li dora xwe gerandin. Digot qey hê jî hin li pey wî hene û dikin werin xwe biavêjin ser wî. Hê jî diricifî...
Nizanîbû bê çi qasî li wira rûnişt. Gava serê xwe rakir û bi awirên vala, li dora niherî, dinya tarî bûbû. Bayekî cemidî û xurt dihat. Mirov nikarîbû li ber wî bayî, xwe li ser lingan zevt bikira û bimeşiya. Mîna kêreke tûj bû. Mîna gwîzanekî... Sermayê hêsir ji çavên mirovan dianîn. Seqemeke dijwar, seqema berfê.
Li kolanan, ji çend kesên ji bo ko xwe bigihînin derinan bi lez dimeşiyan û otobus û minîbusên heta ber dev tije pê ve, tişt tune bû. În-

san giş ber bi malan ve direviyan. Bîstikeke din, ew ê tu kes li derve nemaya. Ji ber ko tariya bêdeng li kolanan kone xwe vedigirt û der û dor dikir hêsîrê xwe. Cihê ko ew lê bûya, însan û deng û hêvî nedibû. Li Diyarbekirê, dîsa bûbû êvar.
Wî ê ev bûyer tu carî ji bîr nekiraya. Ma çend mirov dikare tiştekî weha bijî? Ki bîra ko mirov ji mirinê vegere. Ji kuştinê. Gava sileh di serê mirov de be, mirov dikare li çi bifikire? Û tew çavên mirov girtî bin… Le gava wê fîşeka ko berê xwe dabe mejiyê mirov, li dereke din biteqe? Gava dilê mirov ji tirsa wê gavê bisekine? Ma mirov dikare li çi bifikire? Dê û bav? Xwişk û bira? Hezkirî? Heval?
Di nav hestên tevlihev de, serî di ber de, dest di bêrîkê de, di êvara ko
167
REŞ Û SPÎ

mirov li xwekuştinê difikirand de, li kolaneke Diyarbekir ya vit î vala... Aniha, ger yekî an jî yeka nas derketaya, aniha mirov li ruyekî nas rast bihata… Mirov beyî ko li piçûkketinê û fediya wê bifikire, xwe biavêtaya situyê wî kesê an jî kesa nas û têra xwe bigiriya. Aniha, Nûşîn ji serê kolanekê derketaya. Hemdîn derketaya. Şêxo derketaya... Seydo derketaya...
Der û dor reş û tarî bûbû. Kes li derve xuya nedibû. Lempeyên avahiyên doraliyê, tevde vêketibûn. Ji vê saetê û pê ve, êdî jiyan ketibû hundirê xaniyan. Li derve, hew tirs mabû û bayê kur.
Gava ko dimeşiya, dît ko ji dûranê ronahiya tiştekî xuya dibe. Beyî ko guh bidiyê di qoziya çavan re li wî aliyî niherî. Şewqek ber bi çavên wî ket. Sekinî. Zilamekî kal î rîhspî, di nav kincin ecêb de, gopalê wî di dest de, lê beyî alîkariya wî gopalî, ber bi wî ve hêdî hêdî dimeşiya. Gava hat nêzîka wî, sekinî. Robîn jî serê xwe rakir û li wî niherî. Xwe negirt. Giriya. Ji

bo ko zilam bi giriyê wî nehise, pişta xwe da wî.
Zilamê kal bi gavên giran hat, fitilî û li hember wî sekinî. Destê xwe da ser milê wî. Robîn xwe avêt himbêza wî. Zilêm bi destê xwe ew bi ser sînga xwe ve eciqand û pişta wî mist da. Dîsa bi wî dengê xwe yê nerm ko dilê mirov mist dida û mirov digot qey terbiyeyeke baş stendibû, got:
— Bigirî, Robîn. Bigirî...
Robîn digiriya. Serê xwe danîbû ser milê zilamê kal û digiriya.
Gava ko yek bigirî, divê mirov bihêle, bila bigirî. Ji ber ko girî dilê mirov rehet dikir, hemû kerbên mirov û hêrsa wî vala dikir. Girî jî carinan hewce bû. Pêwîstiyek bû. Zilamê kal ev dizanîbû. Ji ber wê digot:
— Bigirî, Robîn. Bigirî. Dilê xwe rehet bike...
7. Piştî ewqas salan dîsa...
»û li vî bajarî dibûn du bask çavên te
bi wan re min xwe li ezmanên xeyalan dixist...«
Xeweke mirov naxwaze jê şiyar bibe. Xewneke şêrîn.
Bihar e, Newroz hatiye. Li Diyarbekira xopan rojeke xweş. Dengê def û zirnê tê. Dengê deh defan û deh zirneyan... Li meydaneke fireh, di nav qelebalixiyeke mezin de, agirekî gûr hatibû dadan ko mirov dikare tê de hemû heyecana dilê wan kesên li dora wî direqisin bibîne...
Dawiya qelebalixiyê nedihat dîtin. Hê jî ji der û dorê, ji kuçe û kolanan
168

mirov dihatin. Tu axê biavêjî li erdê nakeve. Dêyê weledê xwe avêtiye. Ger tu hevalekî xwe wenda bikî, tu ê hew bikaribî wî bibînî.
Meydan mişt însan. Yek ji wan naşibe yekî din. Esmer, gewr, zer, boz, kej; dirêj, kin, zeîf, qelew; bedew, nebedew; zarok, ciwan, navsere, kal û pîr; pîrek, zilam, keç, xort... Belkî her yek bi devokekî dipeyivî, lê hemû bi zimanekî. Belkî her yek ji deverekê hatibû, lê hemû bi hesretekê. Belkî

di dilê her yekî de agirek hatibû dadan, lê agirê gişan ji wan re eynî tişt digot. Gişan bi hev re eynî tişt dikir. Gişan ji bo eynî tiştî xwe li wî agirî girtibû.
Mîna hev direqisîn, mîna hev distiran, mîna hev baz dida. Mîna hev xwê dida û kêf dikir. Bi wê bazdana li dora êgir, bi wan stranên ko hestên wan radikirin ser piyan, bi dengê def û zirneyan ko tevî dengê stranên wan dibû, giş ji ser hişê xwe ve çûbûn.
Xwe ji bîr dikir. Her yek dibû însanekî din. Giş dibûn însanek. Giş dibûn yek. Tu bibêjî şer, na; tu bibêjî dijminatî, ew jî na. Û bêhna dilx-erabiyê jî nedihat ji wan awiran.
Roja cejnê bû. Newroz bû. Roja şahî û dîlanê bû. Roja biratî, hevaltî û evîndariyê bû. Roja azadiyê bû. Niha gişan ji eynî tiştî hez dikir, gişan eynî tişt dixwast.
Li dora wî agirê mezin, govendeke mezin dihat gerandin. Dest di dest de, mil bi mil, govendeke mezin, ne serî hebû û ne jî binî. Giş bi hev re. Serên xwe kil dikirin û direqisîn. Tu bibêjî westan, tu bibêjî rawestan. Na. Yek jî nedihat bîra wan. Bi dilê gişan bû.
Robîn jî di wê govêndê de bû. Serî jî dikişand tew. Kesî nikarîbû mîna wî bireqisiya. Tew gava ko Şêxo û Hemdîn û Selman jî di milê wî de bû-na... Nûşîn di milê wî de bûya... Serxweş bûbû û çûbû. Xwêdanê di piş-ta wî re avêtibû. Çawa xwe kil dikir...
Robîn nizanîbû. Gelo ev xewn bû, an rastî bû?
Wî carinan weha xewn û rastî ji hev dernedixistin. Tew heke xewneke weha xweş be. Piştî ewqas salan… Piştî ewqas salan dîsa. Ew û Şêxo û Hemdîn û Selman. Çar heval. Çar bira. Çar destbirakê mirinê. Û Nûşîn. Hezkiriya delal, narîn û devliken...
Robîn piştî bîstikekê destmala destê xwe dabû Şêxo û derketibû ortê. Niha, li dora defê milên xwe kil dikirin û direqisî. Xwe bi dengê defê re

radikir û li erdê dixist. Herkesî li wî diniherî. Piştî bîstikekê, Şêxo dest-mala xwe da Selman û ew jî derket hemberî wî.
Bi def û zirnê re li pey hevdu çûn û hatin. Milên xwe kil dikirin, destên

xwe radikirin, xwe xwar dikir û di ber hev re dibihurîn. Bi dû re, dîsa di-hatin. Dîsa xwe kil dikir, destên xwe radikirin û ber bi hev ve dihatin. Bi lêdana defê re destên xwe li hev dixistin. Dîsa li hev dixistin û dîsa...
Gişan ji wan re li çepikan dixist. Gişan li wan temaşe dikir.
Nedixwast bawer bike, lê wî jî texmîn dikir ko ev tiştên hemberî wî giş xewn bûn. Hişê wî tev li hev bûbû. Dizanîbû ko ew ê ev xewn di cihekî de biqede. Belkî ew bi tenê li vêya difikirî. Ji ber wê, hey li çavên hevalên xwe diniherî. Gava direqisî, li Nûşînê diniherî. Nûşîn dikeniya. Destê xwe jê re kil dikir. Nûşîn bi wî halî, ji her demê xweşiktir dibû...
Gava ew di xew de bû, rojeke nû dest pê kiribû. Bi paltoyê wî ser wî hat-ibû nixumandin. Qerisîbû. Gava bi xwe hisiya, nizanîbû bê ji kengî de di xew de bû. Çavên xwe vekirin û li dora xwe niherî. Berê, çav li agirê gûr ket ko li hember wî hatibû dadan. Got qey hê di xew de ye, lê ji xeynî êgir û dîwarên ko bi şewqa wî rohnî dibûn pê ve, tu tişt xuya nedibû.
Wê gavê, fahm kir ko ew govend û ew şahî giş xewn bûn. Lê dengê def û zirnê hê di guhê wî de bû. Ruyê hevalên wî û ruyê Nûşînê hê li ber çavên wî bû. Wî ê tu carî ev xewn jî ji bîr nekiraya. Tew gava ko piştî wê bûyera rojeke berê hatibû serê wî ev xewn dîtibû, dilê wî hebekî rehet bûbû. Baweriya wî bi wî hatibû. Çendekî ji tesîra wê bûyerê xelas bûbû. Kêfa wî hatibû, lê nîvcomayina wê xewnê hin kulên dilê wî jî tev rakiribûn. Ya herî girîng jî ew bû ko ji nû ve bêriya Nûşînê kiribû.
Dora xwe nas nekir. Ji bo ko hebekî germ bibe milên xwe mist dan.

Nizanîbû bê li kû ye, bes ji dîwaran têgihiştibû ko di şikeftekê de ye. Kê ew anîbû vê dera? Çawa hatibû?
Bi tirs li dora xwe diniherî. Kes tune bû. Fikirî. Do bi şev anî bîra xwe. Qey zilamê kal ew anîbû vê derê. Ji xwe, ji wî pê ve li tu kesî din rast nehatibû. Û ji xweber jî nikarîbû bihata vê derê.
Hundir tarî bû, lê ji dawiya neqeba pêşiya wî şewqeke din xuya dibû. Xuya bû ko şewqa rojê bû. Rabû ser xwe, rahişt paltoyê xwe û ber bi wê ronahiyê ve meşiya. Derket derve.
Gava derket derve, hê nû dora xwe nas kir. Li ser bircan bû. Xweşiya der û dorê, şînahiya ezmên, rêyên ko ber bi nava bajêr ve diherin…
Belê, zilamê kal ew anîbû ser bircan. Xwe ewle his kir. Bêhna xwe kişand heta nava dilê xwe û sekinî. Dilê wî şa bû. Ji ber ko ev devera ha mala wî bû. Hêlîna wî ya zaroktiyê bû.
Ro dihate nîvro. Dinya sar bû, lê ne mîna şeva çû bû. Paltoyê xwe li xwe kir. Ber xwe girt. Di pêlikan re daket û ber bi qehwexaneya wî aliyê riyê
170

ve meşiya.
Berê xwe da kaniya hewşê. Kanî vekir bîstikekê lê temaşe kir. Aveke zelal, paqij, xweş... Bi wê ava weke qeşayê dest û ruyê xwe şuştin, destên xwe
dan ber avê û hinek jê vexwar. Rehet bû, bi wê avê re bêhna wî fireh bû. Destmalek ji bêrîka xwe derxist û dest û ruyê xwe zuha kirin û derket. Ket riyê û beyî ko ew jî sedema wê bizanibe, ber bi sûkê ve meşiya.
Gava hat nêzîkî sûkê û çav li qelebalixiya kolanan ket, ji nişka ve bêdengî û valahiya wan a şeva çû hat bîrê. Nakokiya herî mezin ko jiyana kesên vî bajarî dikir du perçe jî ev bû ji xwe. Bi roj, mirov digot qey li dereke din dijîn, êvaran jî li dereke din. Şev û rojên vî bajarî ne dişibiyan

hevdu. Êvar dibû gurek û bi ser bajêr de dihat. Lê gava ko ro derdiket, wî gurî xwe dida alî.
Gava ko dibû êvar, mirov digot qey dawî lê nayê. Hingî dirêj bû, derbas nedibû. Le roj? Roj kin bû. Mirov nizanîbû bê çawa derbas dibû. Bi êvarê re, ji bo ko mirov xwe ji xezeba gurî biparêzin, li starekê digeriyan. Û bi şev gurê har dîsa dadiket bajêr...
Erebeyeke dewaran hat û di ber wî re bihurî. Li aliyê din yê riyê çend pîrekên bikitan, li ser tebleya ko fêkî li ser bûn, bi zilamekî re bazar dikir. Li ber deriyê qahwexaneya ji wan hebekî bi wê de, digel ko dinya sar bû jî zilamekî ji xwe re kursiyek danîbû, pişta xwe dabû dîwêr û rûniştibû. Mînîbusên ko ji gundan dihatin, niha ji bo vegerê rêwiyên xwe didan ser hev.
Di ber postaxaneya mezin re bihurî. Gelek kes li hewşa wê, li ber qulubeyên telefonan sekinîbûn. Berê xwe da aliyê ko piraniya mekîneyan berê xwe dabûyê. Xuya bû ko esil jiyan li wira bû. Ji ber ko dengê stranan ji wî aliyî dihat. Hema mirov serê xwe rakira û li dora xwe biniheriya, bes bû. Ji her dikanekê, dengê dengbêjekî…
Beyî ko bala xwe bidiyê, ji ber lûnaparkê derbas bû. Ji piçûkaniya xwe de ji tişt miştên weha hez nedikir ji xwe. Carinan, gava qereçiyên Riha û Edenê dihat û konê fûarê vedigirt, bi tenê ji bo ko bi qûmarên piçûk bilîzin û li keçikan biniherin, ew û Şêxo diçûnê; lê tu carî kêfa wî ji lûnaparkan re nehatibû.
Gava di ber pirtûkfiroşekî re bihurî, gavekê sekinî û li pirtûkên wîtrînê niherî. Berê ji bilî du-sê heban, pirtûkfiroş tune bûn li vî bajarî, lê piştî ko rewşa welêt jî hebekî hatibû guhertin, hejmara pirtûkfiroşan jî zêde bûbû. Di vêya de qey rola xwendekarên zanîngehê jî hebû. Ji ber ko wan ji her kesî bêhtir dixwend û çi gava ko Robîn ew bidîtana bi misogerî

pirtûk di destên wan de hebû. Vêya dikir ko gelek kes jî ji wan fêrî xwendinê û pirtûkan bibin.
Gava li van tiştan difikirî, lê hay bû ko ji zû de bi rehetî rûneniştiye û tiştek nexwendiye. Berê, ji bo wî, roja ko bê xwendin derbas bibûya belasebeb hatibû jiyîn dihat hesibandin. Ji nişka ve bêriya xwendinê kir û bi wê re jî bêriya pirtûkxaneya xwe û mala xwe...
Kolanên Diyarbekirê, bi roj, dinya çawa be jî heta êvarî vala nedibûn.
Ji ber ko ji êvar de xwe dida bende rojê. Yên ko karên wan tuna bûn jî hema derdiketin û ji xwe re li derve digeriyan.
Yên ko guh nedida seqemê û hêdî hêdî dimeşiyan û ji xwe re li dora xwe temaşe dikir. Yên ko li ser lingan sekinîbûn û bi hev re dipeyivîn, yên ko bi lez ber bi derinan ve diçûn, qelebalixiya zarokên ko ji dibistanan derdiketin, yên ko ji ser tebleyan tişt mişt dikirîn, yên ko ji dikanan derdiketin; dengên wan, dengê der û dorê, yên mekîneyan, yên çivîkan, yê bê... Dengê jînê... Mirov ancax di demên weha de dikarîbû ji vî bajarî hez bikiraya...
Dest di bêrîkê de, ji bo ko xwe ji sermê biparêze serî di ber de û dimeşiya. Di ber bireke mirov re bihurî. Wê gavê, ji nav wan mirovan, keçikek ji nişka ve veciniqî. Heta ko ew derbas bû jî di şûna xwe de mat ma û li wî niherî.
Esmer bû. Bejindirêj û çavreş bû. Şaş bûbû û di pey wî re diniherî. Gava hevalekî wê li rewşa wê hay bû, bi destê xwe ew hejand.
— Nûşîn! Nûşîn, te xêr e?
Nûşîn mîna ko ji ser hişê ve çûbû, bê deng mabû. Dengê wî nedibihîst. Ew mirovên din jî li wî aliyê ko wê lê diniherî, zivirîn. Lê wan tiştek nedît.
— Nûşîn! Nûşîn, çi bû?

Nûşîn ji nişka ve hat ser hişê xwe. Ruyê wê zer bûbû. Devê wê nedigeriya. Diricifî. Dîsa wan ew niqurçand.
— Çi bû, Nûşîn?
Nûşîn li hundirê çavên wan diniherî. Devê wê bi zorê digeriya.
— Ro... Robîn. Ew Robîn bû.
Gişan bi hev re got:
— Robîn?
Nûşînê berê xwe da aliyê ko Robîn diçûyê û meşiya. Hevalên wê jî da dû wê. Bi zorê xwe gihandê û ew zevt kir.
— Tu çi dibêjî, Nûşîn? Robînê çi?
Nûşînê xwe ji nav lepên wan xelas kir û dîsa meşiya. Mîna ko baz dida.
172

Çavên wê hey li wî kesî bû ko di pêşiya wê de dimeşiya. Gava ko bi lez dimeşiya, li bin guhê çend kesan jî ketibû. Xwe gihand Robîn. Gavên xwe sist kirin.
Nizanîbû, dê çi bikiraya. Xwast ko bangî wî bike, lê fedî kir. Le ko ne ew bûya? Wê çaxê, ew ê têketaya ber fediyeke mezin. Ji ber ko çend carên
din jî weha hin kes şibandibûn Robîn û dabû pey wan. Gava ew kes li wê dizivirîn û digot »çi bû, xwişka min«, û lê hay dibû ko ne Robîn e, ji fediya, serê xwe bera ber xwe dida û vedigeriya. Lê vê carê, ji hercar bêtir bawer kiribû ko ew bû.
— Robîn!
Ji zû de bû ko wê bi vî navî bangî kesî nekiribû. Ji ber vê yekê, ev nav hebekî fediyokî derketibû ji devê wê.
Dîsa bang kir:
— Robîn!

Robîn di serî de gotibû qey xelet bihîstiye, lê vê carê, wî ev deng nas kiribû. Di cih de sekinîbû û li dû xwe zivirîbû.
— Nûşîn!
Gava di nav qelebalixiya însanên ko di nav wan re diçûn û dihatin re ew dît, mîna ko ne bi wê re, lê bi kerbên xwe re rû be rû bûbe, bi heyecana dîtina wê re xemekê jî xwe li dilê wî girt.
— Nûşîn...
Ziq li çavên wê diniherî. Nûşîn jî sekinîbû. Xewn e, gelo? Na... Ne mimkun e ko xewn be. Dengê wê bihîstibû. Li hember wî sekinîbû û li wî diniherî.
Belê. Nûşîn bû, ev. Ne xewn bû. Dîsa li hember wî sekinîbû û li wî diniherî. Belê, ne bi qasî Nûşîna di xewnên wî de bedew bû û nedibişirî vê carê. Lê çima? Çima niha? Piştî ewqas salan, piştî ewqas neheqiyan. Çima? Ma qey nizanîbû ko niha ne Robînê berê ye? Ma qey nizanîbû ko bûye nîvzilam, terka hertiştî, terka jiyanê kiriye? Ma qey wê roja dawîn ko li hember hev rûniştibûn û Nûşînê bi awayekî ko dilê wê bi wî bişewite lê niherîbû, ji bîr kiribû? Mîna ko bi yekî biyanî re bipeyive, gotibû »bes e êdî, ez hew dikarim...«
Giş yek bi yek hatin ber çavên wî. Nûşîna wî bû, gula ber dilê wî bû.
Wê gavê dikarîbû ji bo wê mêr jî bikuştana. Lê niha giş li dû mane û bûne dîmenên demsaleke kevin êdî.
Xwast ko bigirî dîsa. Ji xwe çavên wî li hemanan bûn. Ev keçika ko Robîn ewqas sal ew di xewn û xeyalên xwe de jiyandibû, ev keçika ko yek
173
REŞ Û SPÎ

ji wan sedemên ketina wî ya vî halî... Lê niha, li hember wî sekinîbû. Mîna ko li ber bigere, fediyokî, nizanîbû yê hember dê çi bike, lê diniherî.

Çav melûl. Çav liberketî. Çav li hêviya işaretekê. Bûbûn mîna du çemên ko dike di ser re here.
Di nav wê çûyin û hatina însanan re, li orta riyê sekinîbûn û li hevdu diniherîn. Çend kesên ko li wan hay bûbûn, hebekî dûrî wan sekinîbûn û li wan temaşe dikir. Hevalên Nûşînê jî xwe gihandibûnê û gava dîtibû ko bi rastî jî ev ew Robînê ko wan bi tenê di wêneyan de ew nas dikir bû, ew jî mat mabûn û sekinîbûn.
Ruyê wî li gora wêneyên ko Nûşînê rê wan dabûn, hebekî hatibû guhertin, niherînên wî kûrtir bûbûn, rîha wî dirêj bûbû, porê wî bela wela bû û di eniya wî de jî dewsa derbeke ko xuya ye di demeke nêzîk de lê ketiye hebû. Lê dîsa jî dihat naskirin. Dilê wan bi wî şewitî.
Însan di nav wan re diçûn û dihatin. Nûşîn li benda wî bû. Lê, wî tiştekî ko dilê wê xweş bike, nekir. Wî jî nizanîbû çima, lê lêva xwe gez kir, serê xwe bi kerb kil kir, berê xwe jê guhert û meşiya. Ket nav wê qele-balixiyê û çû. Mîna ko ew wê nas nake. Mîna ko tu carî ew nas nekiribe. Lê mîna ko xencereke zingarî di dilê wî de cit bûbe, an jî sînga wî hatibe daxkirin.
Nûşîn li ser çongan xwarî erdê bû. Giriya. Hutikên xwe li erdê dixistin. Carê jî serê xwe radikir, bi çavên xwe yên sorbûyî ko hêsir ji wan dibariyan li wî diniherî û diqêriya:
— Robîîîîn...
Dengê wê digihişt heta guhê Robîn û dikir ko guhê wî biteqe. Dengê wê di guhê wî de olan dida. Lê carekê jî li dû xwe nezivirî û lê neniherî. Serê xwe bera ber xwe dabû. Her gava ko Nûşîn careke din diqêriya, hêsirekî din jî bi hemû germahiya xwe, ji çavên wî diherikî ser hinarikên wî û xwe bera xwarê dida.
Bi dû re wî ê ji xwe re bigotaya:
— Ez nizanim bê çima ez neçûm û min xwe neavêt situyê wê. Ma ne

ez her li benda wê rojê bûm ko careke din jî ez bi van çavan wê bibînim. Ma ne min her bêriya wê kiribû û min xewnên wê didîtin.
Wî ê bigotaya:
— Lê gava ko min ew dît û ez çav li wê niherîna wê ya ko li ber min digeriya ketim, ew niherîna wê ya dawîn ko her gava dihat bîra min, min dixwast ko ez xwe bikujim jî hat bîra min. Ew ne ew bû. Te dît carinan, dilê mirov bi hinan dişewite û mirov dike ji bo wan tiştekî bike, ê min jî
174

weha… Wê gavê yê min jî dilê min bi wê şewitî. Lê min fahm kir ko îmana min jî ji wê diçe. Belkî ev yek ji ber hêrsa min ya li hember neheqiya ko wê li min kiriye be jî. Lê piştî wê rojê, ez her li ber tahba xwe ketim ko min ewqas sal her bi xeyala ruyê wê ber dilê xwe xweş kir, carinan jî êvaran ji kerba wê xew li min herimî û ez heta sibehê li ber ketim, giriyam, min xwe xwar. Wê gavê, min fahm kir bê di wan salan de, çi qasî tişt ji min çûye û ez belasebeb bi pey hin tiştan ketime...
8. Bes şopek an jî işaretek...
Kesî ew nedîtibû. Ev çar rojên wî bûn ko tu xeber ji wî derneketibû. Mîtanî, Bedirxan, Serdar bê serî lê digeriyan. Çi cihê ko Robîn dikarîbû biçûyayê, çûbûn saxt kiribû. Na. Û şopek jî tune bû. Robîn wenda bûbû. Li malê, mîna ko yek miribe, mîna ko Robîn miribe, mîna ko şûna wî hatibe danîn, bêdengî hebû. Kesek ji endamên malê nedipeyivî.
Di serî de, gişan li wî dipirsî, bi hevdu re li wî digeriyan, li ser hin îhtîmalan difikirîn. Gişan dev jî karên xwe berdabû. Mîtanî û Mehabad hew diçûn kar. Serdar û Meryemê jî dev ji dibistanê berdabû.
Giş li malê diman. Êdî nema li wî digeriyan. Hemûyan hêviya xwe birîbû. Wan xeber neda qerekolê jî. Ji xwe, heke polîsan ew biribe û ewqas roj in ko xeber jê nehatibe, miheqek tiştekî nebaş hatibû serê wî.

Dîsa jî bi saya hevalekî Mîtanî û Bedirxên ê ebûqat, li qereqolê lê hatibû pirsîn. Lê di lîsteya navan de, kesekî bi navê Robîn tune bû.
Wan ji neçarî baweriya xwe bi vê bersivê anîbû, lê dîsa jî di nav xwe de, herkesî di dilê xwe de digot qey hayê qereqolê ji wî heye. Ji ber ko gelek kes piştî ko ji aliyê polîsan ve hatibûn girtin, wenda bûbûn. Polîsan ji bo herkesî digot »ne li cem me ye«, lê malbata tu kesî baweriya xwe bi vê bersivê nedianî. Gişan digot; polîsan zarokên me birine. Gişan digot; di-jminê me ne.
Hêvî nemabû. Her gava ko xebereke neyînî dihat malê, serê wan hebekî din diket ber wan. Situyê wan xwartir dibû.
Li mala xwe rûniştin û xwe da bende xeberekê. Xebereke xêrê. Hin meriv, nas û dost jî çi ji dest wan dihat dikir û li şopa Robîn digeriyan. Gişan digot:
— Hema bi tenê şopek, an jî işaretek.
Lê ne tu şop û ne jî tu işaret xuya dibû. Hayê kesî jî ji wî tune bû.
Mîtanî debar nekiribû û di dawiyê de, rabûbû telefonî welêt kiribû. Çi
175
REŞ Û SPÎ

nasên ko li wira hebûna, çi dost, çi meriv, giş rakiribûn ser piyan. Giş bi pey şopa wî ketibûn. Gişan ji hev pirsîbû. Lê çi kesên ko ji wan dihat pirsîn, ew nedîtibû. Çend merivên wan ji niha de ji bo ko werin Stembûlê û li cem wan bin, ketibûn riyê jî.
Yên malê jî hew dikarîbû bi vê kerbê îdare bikiraya. Resûl Beg di nav nivînan de bû. Gava bihîstibû ko Robîn wenda bûye, eynî mîna ko di ro-ja kuştina Seydo de li wî hatibû, pişta xwe dabû dîwêr, çavên xwe veşart-ibûn û bi dizî giriyabû. Dilê wî nema debar kiribû û krîzek hatibûyê. Ji wê rojê de ye ko nikarîbûya rabe ser xwe û her roj textor dianîn ser wî.

Hişê xwe jî wenda kiribû. Kê li derî bixistaya, bi heyecan radibû û digiriya û digot:
— Lawo, derî vekin. Derî vekin, haho! Robînê min li ber derî nehêlin. Robînê bavê xwe li derve nehêlin. Niha qerisiye, nesax ketiye dîsa. Wî bînin. Wî bînin têxin himbêza min. Derî vekin, haho! Derî vekin. Derî negirin. Robînê min li ber derî nehêlin.
Kesî ji devê wî fahm nedikir, lê wî dîsa jî hey digot û digiriya û li sînga xwe dixist. Nexweşiya wî roj bi roj girantir dibû. Resûl Beg… Resûl Begê ko peyva wî li ba xelkê pere dikir. Resûl Begê ko li hemû taxên Diyarbekirê xelkê jê hez dikir. Resûl Begê ko zilamê ko mirov dikarîbû pişta xwe bidayê, li ba wî bisitiriya. Niha bûbû tune. Du lawên xwe wen-
da kiribûn. Du law. Du tayên rihanê...
Ne Resûl Beg bi tenê bû ko ketibû halekî xerab. Leyla Xanim jî êdî ne Leyla Xanima berê bû. Hew dikarîbû bipeyiviya. Ruyê xwe tev de dîsa mîna ko di şûna Seydo de kiribû, çirandibû û di nav xwînê de hiştibû. Her li ser paldanka biniya pencereyê rûdinişt û çavên wê li rê bûn. Her digot qey Robîn aniha dê ji serê neqebekê derkeve û were, were û xwe bi-
avêje himbêza diya xwe.
Serê xwe li dîwaran dixist û digiriya. Li xwe dixist. Dinaliya. Di ber xwe de dilorand. Lawij digotin. Herkesê ko li wê guhdarî dikir, digiriya. Gava ko wê dest bi lawijan dikir, Mîtanî û Bedirxan ji fediyan radibûn derdiketin hêwanê. Serên xwe didan ber hev û ji neçarî digiriyan. Wek zilamên xurt, lê neçar, muxtac, digiriyan. Digiriyan û tişt ji destê wan nedihat.
Leyla Xanim tu carî ji ber pencereyê ranedibû. Hew nan jî dixwar û ze-
wade jî bi devê xwe nedixist. Ji xwe, ji berê de dilê wê ne xurt bû, îja piştî jana herî mezin, kuştina Seydo û bi ser de jî wendabûna Robîn... Carê

diket û ji ser hişê xwe ve diçû. Meryema ko ew di wî halî de didît, digot
176

qey diya wê dimire, li xwe dixist, diqêriya û digiriya.
Vê rewşa malê, tifaqa wan ya ko ji ber şerê wan î navxweyî xera bûbû jî ji nû ve kiribû weke berê. Mirov digot qey gişan wî şerê xwe ji bîr kiribû. Binevş êdî mîna qîzeke malê tev digeriya û berî herkesî karên hundirê malê giş dikirin. Her gava ko Leyla Xanim diket erdê û ji ser hişê xwe ve diçû, berî gişan ew direviyayê û kolonya li ser û çavên wê dikir. Di ber re jî digiriya, li ber diket. Wan ew derdên xwe giş ji bîr kiribûn. Wendabûna Robîn ji nû ve tifaq xistibû malê...
Mîtanî û Serdar ne wek Leyla Xanim û Resûl Beg bûn, wan hêviya xwe nebirîbû. Robîn ji bo wan ne bi tenê weke birayekî bû. Mîtanî ji cerga ko bi nexweşiya Robîn hisiyabû, bi çavekî din li wî diniherî. Heft salên Robîn bûbûn ko tu kar nekiribû; lê Mîtanî carekê jî ji ber vêya minet li wî nekiribû. Ji ber ko birayê xwe baş nas dikir û wî jî mîna diya xwe ew dixist şûna Seydo, dilê wî pir bi ser wî de bû.
Serdar ne bi qasî Mîtanî xurt bû. Ew bi dizî digiriya. Belkî ji Robîn hînî vî awayî bûbû. Wî jî weke Robîn, tiştekî xwe eşkere nedikir êdî. Ma ne ewqas sal in ko herkesî bi rewşa Robîn dizanîbû, lê kesî ji wan nizanîbû bê derdê wî çi bû. Wî jî, hey digiriya û serê xwe bi dizî li dîwaran dixist. Robîn mamosteyê wî bû. Wî ji xwe re weha digot û qebûl kiribû...
Berê lê hay nebûbû, gava di ber odeka wî re bihurî, carekê xwast ko li hundirê odekê binihere. Ji cerga ko Robîn wenda bûbû, ji ber ko ber xwe nedîtibû, neketibû odeka wî. Ne ew tenê; yên din jî neketibûn odeka wî. Hew carekê, ew jî gava Leyla Xanim bêhiş ketibû, ji bo ko kolonyayekê bibîne, Binevş bi şaşî ketibû odekê. Qey ji ber wê teşqeleyê bû, ko nehat-ibû bîra wan.

Vegeriya û deriyê odekê vekir. Li hundir niherî. Gava çav li nivînên wî ket, kelogirî bû. Berê xwe guhert, debar nekir. Lê dîsa jî vegeriya û ket hundir.
Di serî de, lê hay nebûbû, lê gava ko li erdê niherî, wêneyên jihev-belavbûyî dîtin. Daqul bû, rahişt çend wêneyan û li wan niherî. Di wêneyekî de, li ser bircan, Robîn û du hevalên xwe xuya dibûn. Yek ji wan dirêj û xurt bû; yê din qut î şidiyayî bû. Wî ew kesê dirêj nas dikir. Şêxo bû. Pişta xwe dabû dîwarekî û li devereke ko di wêne de xuya ned-ibû, diniherî. Lê yê din nas nedikir. Ew qet nedîtibû. Di destê wî de kêrek hebû, bi wê kêrê darikek tûj dikir û li objektîfê diniherî. Dibişirî.
Di wêneyê din de jî dîsa li ser bircan bûn. Lê vê carê, yê qut çûbû û keçikeke esmer hatibû, di nav Şêxo û Robîn de rûniştibû. Ji kincên li ser

wan têgihişt ko herdu wêne di eynî rojê de hatibûn kişandin. Qey wêneyê yekem ji aliyê keçikê ve û yê din jî ji aliyê wiyê qamkinik ve hatibû kişandin.
Wêneyê binî jî derxist, lê niherî. Disa li ser bircan bûn. Lê keçik bi tena serê xwe bû. Roj li paş kesê ko wêne dikişîne bû û dida ruyê keçikê. Siya kesê wêne dikişand jî xuya dibû. Keçikê çavên xwe ji ber şewqa rojê girt-ibûn û dikeniya. Hebe nebe, yê ko siya wî xuya dibe, Robîn e. Ji ber ko wêneyê çaremîn jî yê Robîn û vê keçikê bû û Robîn bi awayekî ko ev wêne bi zorê pê hatibe kişandin, fediyokî li objektîfê diniherî.
Robîn tu carî behsa vê keçikê nekiribû û Serdêr ev wêne qet nedîtibûn; lê qey ev keçik hezkiriya Robîn bû.
Serdêr ji rewşa odekê fahm kir ko Robîn berî ji malê derkeve, li van wêneyan niherîbû. Wêne giş ji erdê dane hev û ew danîn ser maseyê. Wê

gavê, di nav deftereke li ser maseyê de, çav li tiştekî ket. Serê kaxizekê xuya dibû. Beyî ko giringiyekê bidiyê, ew kaxiz ji wira kişand û vekir. Helbesteke piçûk tê de hebû. Serdêr ew bi lez xwend:
Evîn bi dawî bûn, hezkiriya Diyarbekirî
Temenê xwe temam kir jiyana bicîwarbûyî
Tu kes kedîkirî nîne êdî...
Bîstikekê sekinî û li ser helbestê fikirî. Ket bin tesîra wê. Wî tu carî helbesteke weha nexwendibû. Devê wî ji hev çûbû. Gava ko hebekî fikirî, lê hay bû ko kêfa wî pir ji zimanê kurdî re tê...
Lê belê, xwediyê vê helbestê kî bû? Gelo ev helbest ya Robîn bû?
Wî berê jî helbestên Robîn yên ko di kovar û rojnameyan de derdiketin dixwendin, lê helbesteke wî ya weha nedîtibû. Ji xwe, Robîn helbestên xwe bi kesî nedidan xwendin. Piştî ko dihatin weşandin wê çaxê dihatin xwendin.
Çawa dikarîbû îdare bikiraya, lawo! Heke Serdar bûya, qet nikarîbû xwe bigirtaya. Wî dê her helbesta xwe berî ko bidaya kovarekê an jî roj-nameyekê, ji herkesî re bixwendaya û ber dilê xwe xweş bikiraya.
Ma çima ev hemû nivîskar giş weke hev in? Hema di kar û barên wan de esrarengîziyek heye. Mirov dibêje qey tu karî nakin, lê ji nişka ve berhemekê derdixin ko hişê mirov nagihêjê. Belkî ji ber wê, ew jî nebûbû nivîskarek.
Bi dû re, di dilê xwe de got:
— Na, lo! Ma çi pêywendiya nivîskariyê û van tiştan bi hevdu re heye.
178

Heke mirov di vî karî de, jîr û zane be, ji xelkê veşêre jî veneşêre jî ji xwe dîsa berhema wî derdikeve. Ma kes dikare riyê li ber vêya bigire? Dibe ko ew ji diziyê ditirsin û ji ber wê, heta ko xelas nebe, ji kesî re behsa

berhemên xwe nakin.
Wî ji xwe re weha digot, lê wî tu carî bîr nedibir bê ji bo çi nivîskar giş ecêb bûn û nedişibiyan însanên normal. Jiyana wan, tevgerên wan, fikrên wan... Gelek kesan mîna ko ji bo Robîn jî carinan weha dihat gotin, ji bo nivîskaran digot ko ew dîn in. Lê ya rastî, kesî jî newêrîbû behsa vê yekê ji wan re bikiraya.
Gava li wan tiştan difikirî, rewşa Robîn a berî ko wenda bibe hat bîra wî. Wê gavê, heq da wan hemû kesên ko ji wan re digot ko ev dîn in. Lê dîsa jî xweziya xwe bi dilê wan kesên dîn anî.
Helbest di destê wî de, ji xwe re difikirî û di odekê de digeriya. Gava berê wî ket dîwêr, mîna li tiştekî ko heta niha nedîtibe rast hatibe, sekinî û bala xwe bi heyecan dayê. Li dîwêr wêneyekî çarçovekirî hebû. Di wêne de, pireya dehderî xuya dibû. Dicleya ko di bin wê re diherikî û diçû jî bi hemû bedewiya xwe li ber çavan bû. Jê hebekî bi wê de jî bircên keleha Diyarbekirê xuya dibûn.
Wî heta niha, ewqasî guh nedabû vî wêneyî. Lê wê gavê, mîna ko di biniya wî wêneyî de, ji wê dîmena pireya dehderî û Dîcleyê kûrtir tiştekî din hebe, lê diniherî. Her tiştên ko li odeka Robîn çav lê ketibû, di serê xwe de anîn ber hev. Fikirî.
Wêneyên ko li ser bircan hatibûn kişandin, helbesteke li ser hezkiriyeke kevin a Diyarbekirî, pireya dehderî, Dîcle û Robîn...
Çavên wî ji nişka ve fireh bûn. Veciniqî. Kaxizên destê xwe avêtin erdê û ber bi aliyê hêwanê ve baz da.
Derî bi carekê vekir û ket hundir. Gişan li wî diniherî. Mîtanî û Bedirxan bi ketina wî ya hundir re rabûbûn ser xwe. Herduyan jî gotibû qey tiştek bûye. Lê di ruyê Serdêr de, mahneyeke din hebû. Dikeniya. Diqêriya.
Bi wê re dengê telefonê hat. Giş mat mabûn. Deng ji Serdêr jî biliya.

9. Min ji vira bibe Gulcan, min bernede...
»li qiraxa Dîcleyê du evînên kêrkirî
du evînên ji êgir
û xwe digihînin lêvên min...«
179
REŞ Û SPÎ

Du roj derbas bûbûn ko ji wira derneketibû. Hew dikarîbû bi roj ji şikeftа xwe derketaya êdî. Dizanîbû; heke dîsa bihataya girtin, vê carê kesî nikarîbû ew ji mirinê xelas bikiraya. Lê ji bo ko xwe veşêre, êdî sedemeke din jî hebû. Ji Nûşînê direviya. Ji xwe direviya.
Gava dinya tarî bûbû, nema dikarîbû bi xwe û derketibû. Lê dîsa jî newêrîbû biçûya nava bajêr. Ji lewre, daketibû biniya bircan û xwe ji wira bera qiraxa Dîcleyê dabû. Li dengê wê û bêdengiya şevê guhdarî kiribû. Heta ko xewa wî hatibû jî li wira mabû, li ava Dîcleyê ko stuxwar diherikî, niherîbû û giriyabû.
Kî bîra ko mirov di şikeftekê de xwe bi xwe mahkûm bibe! Êvaran jî bi tenê bikaribe were qiraxa çemekî mîna Dîcleyê ko bûye şahidê dîrokê. Mîna însanekî nefîkirî...
Roja din jî heta ko lê bûbû êvar, serê xwe ji şikeftê dernexistibû. Gava ko êdî birçî bûbû jî bi dizî daketibû jêrê û ji pîrekeke ko nan bi tenûrê ve dida, nanek stendibû û tisî xwaribû. Pîrek di serî de ji wî tirsiyabû, lê digel wê tirsa xwe, beyî ko tiştekî bipirse, nanekî germ jî dirêjî wî kiribû. Mîna ko ev sed salên wî bûn ko di wira de bû... Nema dikarîbû bi devereke din jî biçûya. Êdî an ew ê li benda mirina xwe bimaya, an jî ew û şensa xwe... Belkî hin bihatana û ew ji wira xelas bikiraya.
Ro derbas nedibû. Sebra wî nemabû. Ji libendemayinê westiyabû û di xew re çûbû. Gava çavên xwe vekirin û li aliyê derve niherî, tarî ketibû

erdê. Laşê xwe yê giranbûyî bi zorê ji erdê rakir û derket. Hingî li erda sar raketibû, her derê wî pûç bûbû. Lingên wî qerimîbûn. Ji pêlikan bi zorê daketibû.
Lingên wî ew dîsa bir goristanê. Dîsa berê, li ser mezelê Hemdîn sekinî, daqûl bû û serê xwe danî ser kevirê gora wî û giriya. Pêwîstiya wî bi hevalekî hebû ko serê xwe deyne ser milê wî û bigirî. Bi tenê bû, aciz bûbû, hemû hêviyên wî têk çûbûn...
Li ber serê Hemdîn têra xwe giriya. Bi dû re çû ser mezelê Seydo. Du kesên ko niha dixwast xwe biavêje himbêza wan... Du kesên ko dikarîbû himbêzên xwe ji wî re vekirana û ew aş bikiraya. Du mirî, du term, du bîranînên heta û heta...
Bi tenê bû. Nizanîbû bê divê çi bikiraya. Heta dereng, li goristanê mabû. Bi dû re, ji ber tirsa xwe, hew li wira debar kiribû, dîsa vegeriyabû ser bircan, şikefta xwe. Li wira jî têra xwe giriyabû û hingî westiyabû, serê xwe çawa danîbû, di xew re çûbû. Yekî ko beyî şer bike têk çûbe çawa bigirî û di xew re here, ew jî eynî weha...
180

Dîsa tê dernexist. Xewn bû an na? Ji xwe, ji bo wî, tu tişt ferq nedikir. Ha xewn, ha rastî. Herdu jî weke hev bûn. Mirov çawa di nav qelebalixiya bajarekî de, bi tena serê xwe be; çawa di jiyana ko mîna çemekî diherike de, mîna miriyekî be, eynî weha.
Ro dikira hilataya. Lê hê jî tarî bû, bes bêhna sibehê jî ne ewqasî dûr bû. Bayê kur dengê xwe birîbû, mirov digot qey li wî temaşe dike. Diyarbekir hê di xew de bû.
Robîn rabû meşiya û çû derket serê bilindahiyekê. Berê, li jêrê temaşe kir. Sekinî. Ev bajarê di xew de, ev bajarê ko him bûye warê evînên wî yên kevin him jî bûye bîreke kûr î bêbinî, bîra bitenêtiya wî... Her der bêdeng

bû, her der di xew de. Li Diyarbekira ko xwe dabû qiraxa sibeheke nû, diniherî. Mîna ko mirov li wêneyekî xwe binere. Mîna ko mirov li çavên hezkiriyeke xwe ya kevin binere.
Bîstikeke din, hemû melayên Diyarbekirê dê dest bi azana sibeha nû bikiraya. Bistikeke din belkî hayê kesî jî jê çênebûya. Belkî ne xema kesî bûya jî.
Bîstikeke din Robîn ê bimiraya...
Hingî giriyabû mejiyê wî dewx bûbû. Hêsirên çavan di ser hev re diherikîn. Çavên wî êdî baş fêrî girî bûbûn. Nema tiştek didît.
Xwe amade kir ko biavêje jêrê. Gava li jêrê niherî, serî wî gêj bû û bi şûn ve kişiya. Ma mirov çawa dikarîbû bi rehetî xwe biavêtaya himbêza mirinê?
Dîsa gava xwe avêt û hat li qiraxê sekinî. Gava li jêrê niherî, sekinî. Li wira, xeyala agirekî bi ber çavên wî ket. Agirekî xweş, agirekî gûr. Agirekî ko pêtî di ezmanan re derdiket.
Du kes li dora êgir rûniştibûn. Du zilam. Herduyan jî serên xwe rakiribûn û li Robîn diniherî. Yek ji wan, bi qasî ko mirov bi saya şewqa êgir didît, xort bû. Destên xwe rakiribûn û jê re digot:
— Were Robîn, were ba me...
Dengên wan bi zorê dihatin wî. Robîn dengê wan kesan nas dikir. Piştî ko Robîn dengê wan nas kir, an jî wî digot qey weha bû, ruyên wan jî zelal bûn.
Herdu jî zeîf bûn, herdu jî dirêj. Yek ji wan, temberiya wî ji kêlekê de vebûbû, simbêlin wî yên xweşik hebûn ko bi ser lêva wî ya jêrê de dadiketin, ruyê wî yê gewr li ber şewqa êgir dibiriqand. Zilam dibişirî. Yê din, yê ko ji yê kêleka xwe ciwantir bû, wî jî destê xwe bilind kiribû. Porê wî mîna yê eskeran, kin bû. Ji niherînên wî xuya bû ko ji zû de çav li

REŞ Û SPÎ

Robîn neketibû.
— Were Robîn, were...
Robîn ji bo ko xwe biavêje cem wan, li cihekî geriya, lê belê birc pir bilind bû.
— Were Robîn, were...
Robîn dikira xwe biavêtaya jêrê, dît ko di şûna herdu kesan de, wan kesên ko bîstika din destên xwe jê re bilind kiribûn û gotibû »were,« du şûrên ko li ber êgir dibiriqandin hatibûn citkirin. Dora êgir, bi şûran ve mişt bûbû. Xwe bi zorê zevt kir. Heke xwe negirtaya, ew ê biketaya ser wan şûran.
Bêhna wî dikira biçikiya. Serê wî gêj bûbû. Ji bo ko nekeve xwarê, dîsa bi şûn ve kişiya. Bes vê carê, pişta wî li tiştekî din ket. Bi tirs li dû xwe zivirî.
Zilamê ko sê roj berê sileh xistibû serê wî û ew bi zorê ji destê wî filitîbû, niha awirên xwe tûj kiribûn û li hember wî sekinîbû. Di destê wî de dîsa sileh hebû. Robîn veciniqî. Xwast ko bireve, lê bi kû de? Li dû wî tu cih tune bû ko bireviyayê. Yan ew ê li bende bisekiniya ko zilam lingê de-vançeyê bikişîne û wî ji vî ezabî xelas bike, yan jî wî ê xwe biavêtaya jêrê û bikuştaya. Robîn dikira ji tirsan, bimiraya. Diricifî.
Zilêm sileha xwe rakir û da eniya wî. Dilê Robîn dikira bisekiniya. Li jêrê niherî; şûr hê li şûna xwe bûn. Dîsa li zilêm zivirî. Zilêm sileh bi eniya wî ve zeliqand.
— Xwe biavêje!
Nizanîbû bê dê çi bikiraya. Li herdu aliyan jî mirin hebû, li herdu aliyan jî mirin feqeke vedayî bû. Ma qey mirov dikarîbû ji nav mirinan, mirinek hilbijartaya ji xwe re? Ma mirov qet dikare? Ma qet weha dibe?..

Çavên xwe girtin û xwe da bende, serê xwe ber bi jorê ve bilind kir. Hey diricifî. Bi zorê li ser lingan disekinî. Hêsir ji çavên wî diherikîn ser hinarikên ruyê wî. Mirin li ber serê wî sekinîbû. Ne Ezraîlek bi tenê, lê ezraîlên bêhejmar dora wî girtibû. Êdî hertişt xelas dibû.
Malbata wî hat bîrê. Ji cerga ko ji malê derketibû, tu carî ewqasî nexwastibû ko li malê be. Lê aniha, çi dixwast ko li mala xwe rûniştî bûya! Belkî niha, hayê dê û bavê wî jî ji wî tune bû. Belkî kesek bi çûna wî jî nehisiyabû. Xwe pir bi tenê his kir.
Zilêm ling kişand û sekinî. Dengê şerqîniya lingî bi tenê hatê. Bi tenê dengê lingî. Wî dengî jî li der û dorê olan da û li wan vegeriya. Robîn xwe da bende ko bimire. Lê, nedimir. Gule nedihat. Gule nedigihişt eniya wî.
182

Ji nişka ve, ji dûranê dengek hat bihîstin. Dengekî din. Ji xeynî yê vî zilamî. Ji xeynî yê vî zilamê ko ji bo kuştina wî hatibû. Dengekî xweş. Dengekî nerm. Dengekî nas. Dengê keçikekê...
— Robîn!
Deng bangî wî dikir. Lê ka xwediya vî dengî. Ew li kû bû? Çavên xwe vekirin. Zilêm hê sileha xwe dabû eniya wî û li wî diniherî. Zilêm hey ling dikişand, lê devançe nediteqiya. Robîn newêrîbû bersiva wî dengî bidaya. Wî dizanîbû, heke dengê xwe bikiraya, vê carê devançe dê biteqiya. Gule li hemanan bû.
Ew deng dîsa hatê.
— Robîn!
Robîn hew xwe zevt kir. Bi qasî ko ji wî hat, heta ko qirika xwe biqetîne, qêriya.
— Haaahoooooooo...
Qêrîna wî heta gihişt ezmanan jî. Hin malên der û dorê bi dengê wî re,

lempeyên xwe pêxistin. Çend çivîk ji ser darekê bi firê ketin.
Ew jî bi dengê xwe, bi xwe hisiya. Hê diricifî. Çavên wî yên ko fireh bûbûn, li ezmanê ko dike rohnî bibe digeriyan. Digiriya. Bi hemû tirsa xwe, bi hemû hêrsa xwe.
Dîsa ew deng hatê.
— Robîn!
Ev dengê nerm. Ev dengê xweş. Ev deng... Dengê Gulcanê...
Bi heyecan li wî dengî zivirî. Peyv ji xweber ji devê wî derketin.
— Gulcan!
Gulcanê serê wî danîbû ser çonga xwe û ruyê wî mist dida. Hêsir ji çavên wê diherikî...
Robîn ecêbmayî mabû. Xwîna wî sekinîbû. Rîha wî hatibû, porê wî tev li hev bûbû, çavên wî nepixîpûn. Ji ber tirsa kabûsê bîska din jî ruyê wî zer bûbû. Hema xwe avêt sitûyê wê û giriya.
— Min ji vira bibe, Gulcan. Min bibe, min bernede...
Herduyan hevdu himbêz kiribû û digiriyan. Gulcanê ew bi ser sînga xwe de dieciqand û pişta wî mist dida. Mîtanî û Bedirxan li dû wan sekinîbûn. Serên xwe bera ber xwe dabûn. Mîtanî digiriya.
Ji wan bi wê de, du kesên din jî xuya dibûn: şifêrê ko gava du zilaman Robîn dibir ew dîtibû.
Û Elî. Eliyê Artîst. Serê xwe bera ber xwe dabû û li ber xwe diniherî.
Û Zilamekî kal. Xwe dabû ser gopalê xwe û li wan diniherî...
183
REŞ Û SPÎ
BÛBÊ ESER
Roman
**

RISTEMÊ ZAL

DERHEQA DESTANÊ DE ÇEND GOTIN

RISTEMÊ ZAL

(TUHEMDEM)

Destanek Gelêrî

Berhevkar: EDÎB POLAT

Çîroka Ristemê Zal ji mêj ve ye ku di civat û caxîyên Kurdan de tê zimên. Sedemî ku di edebîyeta devikî de cîh girtîye, ji hezar salan vir ve ye wunda nebûye û nifş bi nîfş gihîştîye heta îroj. Hûn jî dizanin ku bawerîyek pir xurt di nava gel de heye; dibêjin Ristem bi eslê xwe Kurd e. Em dê vê mijarê niha deynin alîyekî, lê di vê destanê de rastîyek wuha dertê pêş: Kurd û Faris ji qewmekî vejiyane û herêma ku heta îroj lê dijîn jî yek e.

Seydayê Cegerxwîn di gelek helbestên xwe de Kurdbûna Ristem û malbata Keyanîyan tîne zimên. Seyda di helbestek xwe de wuha dibêje:

“Ka Ferîdûn, ka Direfs, taca Keyan li kû ye,

Ka Guhderz û ka Ristem, ka ew meydan li kû ye?”

Hûn dê di nava rûpelên vê berhemê de gelekî rast li navê Guhderz werin. Ew lehengekî destanê ye û merivê Ristem e. Cegerxwîn bo wî bi navê “Em Guhderz in” helbest jî nivîsiye. Rêzên wê wuha dest pê dike:

“Em Guhderz in, serbilind in, devçirên in,

Weke Ristem bidin deng.. A

(Ji bo bîranîna 12. a salvegera nivîskariya Edîb polat.) Li gor rîvayetê, hukumdarê bi navê Dehhaq hezar sal li ser textê pederşahîya Îranê dimîne û zulm li gel dike. Gava nexweş dikeve, li ser milên wî du mar çêdibin. Mar mezin dibin, hêç û

har dibin. Bona ew Dehhaq nedşînin, divê her roj mêjîyê du xortan bixwun! Dehhaq jî rojê du gêncan bi qurbana wan dike. Demek wuha derbas dibe, qewraş û xizmetkarên qesrê, bi vê yekê diêşin, dilê wan bi xortan dişewute. Vêca biryar didin; rojê mêjiyê xortekî derînin û mêşinekî serjê dikin, mêjîyê mêşinê bi dizî li nav mêjiyê wî xortî dixin, xortê din jî azad dikin. Helbestvanê Faris yê menşûr Fîrdevsî derheqa vê rîvayetê de wuha dibêje:

"Bi vî awayî, her meh sî xort canê xwe xelas dikirin. Demek bi şûn de hejmara wan dibe du sed. Aşpêj her roj ji wan re çend mîh û bizin jî dişîne. Ev e, qewmê Kurd yê îroyîn ji wan çêbûne."

Ristem kî ye?

Zal û kurê wî Ristem ji alî Zabilistanê (Sîstanê) ne ku ew herêm, li alî bakurê Iranê dikeve. Di dewra sê şahên Iranê, Kubad, Kawûs û Xusrev de ew serpêhlewan bûn û fermandarê artêşê bûn. Lêkolîner dibêjin ku, Rostem nêzîkî hezar sal berî Mihemmed Pêxember hatiye dunê. Li gor rîvayetan, dibêjin rojekê Hizretî Elî şerekî dijwar dike û gelekî diweste, ji hayho dikeve. Hz. Mihemmed jê re dibêje "Ya Elî! Te îroj şerekî Ristemî kir. Te pîroz dikim!"

Hz. Elî ew roj gelekî miraq dike, dikeve xeteran û ji xwe re dibê "Gelo Ristem kî bûye ku tewer Pêxember jî nav û dengê wî bihîstiye! Qey ew ji min jêhatîtir bûye?" Ew şev Rostem tê xewna wî: dibîne ku babaegîtek li hespekî suwar e, li bayê bezê ber bi wî tê. Suwarî tê û silavê lê dike. Lê belê ew suwarî seba ku gelekî gir e û bi heybet e, devê Hz. Elî diqufule û zimanê wî nagere, nikare silava wî jî bigre. Suwarî dibuhure, Hz. Elî

bîstkê bi şûn de tê xwe. Bi xwe re dixeyîde: "Ez newêrek im, ziravê min nîn e! Çawa yekî mîna min ku ez şêrê Xwedê me, ji tirsa suwarîyekî silava

Xwedê jî ji bîr bike!” Dotira rojê diçe cem Pêxember, xewna xwe jê re dibêje. Hz. Mihemmed wuha bersiv dide wî: “Ya Elî! Dest di ser dest re heye. Mêrxasê ku hatiye xewna te Ristem e.”

Dîroknasê bi nav û deng Şerefxan, di destpêka pirtûka xwe ya bi navê ŞEREFNAME de bo Ristemê Zal wuha dibêje:

“Wekî ku tê fêmkirin, navê ‘Kurd’ mîna xusûsîyetek ku sedem gernasîyek bêhempa û bi hawê cîhnavkê li wan hatiye kirin. Isbata vê yekê ev e ku piranîya mêrxas û gernasê bi nav û deng yên dîrokî, ji nava vê nêtewa qehreman derketine. Mînak, egîdê menşûr Ristem bîn Zal ku di dema Key Kubad de jîyaye, yek ji van e. Ev mêrxas, sedemî ku li herêma Sîstanê (Zabilistanê) hatibû dunê bi navê Ristemê Zabilî jî dihat nasîn. Nivîskarê Şêxnamê helbestvan Fîrdevsî, wî bi navê Ristemê Kurd dide nasîn.”

Gelek nivîskar û hunermend heta niha derheqa Ristem de Berhem afirandine. Tewer hunermendên Ewrûpî beşek ji çîroka Ristem kirine fîlm jî. Fîrdevsî bi awayê helbestî destana ‘^êxên Iranî” nivîsiye. Helbesta Mattahew Arnold ya bi navê “Suhrab û Ristem” jî gelekî ba^ş e.

Di pêvajoya amadekirina pirtûkê de min rastîyek din dît. Piranîya navên pêhlewan û lehengên ku di destanê de derbas dibin bi Kurdî ne. (Mînak: Guhderz, Pêşeng, Ferhat, Rexş, Rûdabe, Bijen û hwd.) Di dewra Ristem de nêtewe hêja tune bûn li rûyê erdê. Tenê eşîr û gel hebûn. Lê belê mirov dikare bêje,

3 Şerefname, Şerefxan-Werger: M. Emîn Bozarslan, Weşanen Deng, rûpel:21-22

reha gelek gelên Rojhilata Navîn digihîje hev. Wê demê, malbata Şahrn Iranê KEYANIYAN bûn. Lewma li prş navê padîşahan bêjeya ‘Key’ hebû; Key Kawûs, Key Kubad, Key Xusrev. Di dema van her sê keyayan de jî Ristem fermandar bû. Lewma Keyxusrayê Mübarek navekî din li kurê Zalê

kiriye: Tuhemdem. Yanê bi mana tu her dem heyî û nûjen î! Jixwe, niha jî di nava Kurdan de ji muxtar û rêvebirên gundan re “Keya” tê gotin.

Me bi tehera destanî ev berhem nivîsî, lê belê carna bi pexşenî em lê germ bûn, carna jî me destê xwe bir ber guhên xwe û me kilam qîrand.

Çavkanîyên me yên vê berhemê ev in:

1- Çîrokbêj Evdilqadirê Cafo. Niha li gundê Çorepa ku girêdayî qeza Bismil e, jîyana xwe didomîne.

2- Dîwana Wunda-Muhsîn Kizilkaya, Weşanên Iletîşîm.

3- Evdilqadirê dengbêj- Çavkanî: M. Kizilkaya, di pirtûka Dîwana Wunda de.

4- Sam, Zal û kurê wî Rostem-Norma Lorre Goodrîch- Weşanên Pêrî.

5- Şêxname-Fîrdevsî: Çar Cîld, Weşanên Wezareta

Perwerdeyîya Nêtewî (Turkîye).

Hêvîya min ev e ku, ev çîrok dê alîkarîya geşbûna wêjeya Kurdî bike.

Edîb POLAT

Dîyarbekir-2000

1.

Dilê Qralê Iranê Ferîdûn bi mirina her sê kurên xwe gelekî şewutî bû. Lewma di nava êş û elem, derd û keseran de, demek bi şûn de wî jî jîyan ji dest da. Piştî wî, Minûşîre kurê Manû bû Şahê Iranê.

Minûşîre Manû li ser cenazê Ferîdûn taca padîşahîyê da serê xwe û kincên wî yên bi xwîn li xwe kir. Gora wî, nîvî ji kevirê lacîwerd û nîvê din jî ji zêrê sor da çêkirin. Giregir û porspîyên Iranê gava li ser qebra Ferîdûn civîyan, Minûşîr wuha axifî:

“Li taca zêrîn ya serê min û li textê bin min yê ji diranên fîl nanihêrin, bona min ne girîng in ev; ez gurzê destê xwe bikartînim û şûre xwe qet naxim kewdan. Ka bêjin, di vî welatî de yê ku ala Kawayê Hesinkêr hildide kî ye" Ji bilî min kesek heye" Na. Mirovên ku zulm û tadeyiyê li feqîr û fuqaran, li xulam û qewraşan bikin û bi malê dunê fexr û tox bibin, li ber çavê min kafir in û ji Ehrîmen jî xerabtir in. Kesên wuha, bila bizanibin ku hetanî ez li darê dunê bim, ez dê şûre xwe ji serê wan re tûj bikim!”

Guhdaran heq dan Minûşîr: “Padîşahd délai başîya me dixwaze. Bav û bapîrên wî ev tac û text, bona ew urf û toreyan bincîh bîne jê re hiştine. Bila hetanî qiyametê lê helal be!”

Serpêhlewanê Iranê berî wê gavê Neriman bû, lê belê şerekî mezin li çîyayê Sîpendê qewumî bû û ew li wur hatibû kuştin. Kurê wî Sam jî li civatê, li cîhê şî^ amade bû û rabû piya got:

“Ya padîşahê xwey edalet! Hukumdarên berî te, bona ez raçavîya te bikim, şîret û wesyetan li min kirin. Heq û dadî li te, bincîhanîna wan jî li min! Hêvîya min ev e, wê Xwedayê şev û rojan temenekî dirêj bide te û her tişt li gor dilê te bike! Bextê te vekirî be! Bila dewran erda bin piyê te û textê fîrûze jî her dem cîhê te be! Bi wî şûre xwe yê Hindê rûyê dunê ji xeraban paqij bike, frîqet be, ez bi te re me! Yê ku te ji neyaran biparêze ez im. Ji bav û kalan ve em pêhlewan in; xelkê heta îroj xwe avêtîye tor û bextê me! Gurşasp û Nerîman jî fermandar û şû^ş bûn.”

Piştî axaftinan, Minûşîr gelek dîyarîyên giranbuha pêşkêşî Sam kir û ji herêma başûre rojhilat, hetanî bigre qeraxa çemê Indûsê (Zabilistanê) xist bin hîmayeta wî.

Zarokên kurîn ji Sam re çênedibûn. Lewma, kul û keder û hesreta dilê wî, çêbûna kurekî bû. Wî nedixwest ji dunê warreş here. Di nava carîyeyên wî de jinek porzêrîn, rû ji pelên gulê hebû ku bêhna misk û emberê hertim

jê dihat. Di nav jinên xwe de Sam, pirtirîn ji wê hez dikir û zarokek kurîn jê dixwest.

Samê Nerîman, gava ji ser mezelê Ferîdûn ji cıvata Minûşîr zîvirî malê, mizgîn dan wî, gotin ew jina te ya

8

porzêrîn bihemle ye. Roj û hefte, meh û demsal buhurîn, wext derbas bû, hemla wê giran bû, neh meh û deh rojên jinikê xelas bû. Canê wê êşîya, hemlê zor dayê, sekin û tebat nehatê, rabûn gazî hekîm û pisporên welidandinê kirin, pîrik û dadîyan li ser civandin. Di nava hêwurze û qare warê de, di bin bêhna xwînê de lawek jê re çêbû. Lê ne zarok bû, dabetulerd bû; weke sakê gamêşê gir bû. Rûyê wî mîna rojê şewq dida. Kurekî çavşîn û porspî! Tewer birû û bijangên xwe jî çîl spî bûn. Ecêb û sosretek wuha giran kesekî nedîtibû. Pîrek û hekîm jê tirsîyan. Kesekî taqet û cesaret nekir ku here vê yekê ji bavê wî re bêje, mizgînîya çêbûna zarok bidê. Hetanî hefteyekê jê veşartin, jinên Sam bi şev û roj li ber serê wî girîyan, li çokên xwe xistin. Bav lihevhatî û dê jî xweşik bû, lê gelo zarok çima wuha bû? Mîna têjika cenawurekî bû. Gewde mezin, porpembo! Hemî mûyên canê wî mîna hirîya pez bû. Sam jî miraq dikir, dipirsî da wê kengê jinik têkeve nav cîya. Dapîrkek hebû di qesrê de, gelekî mêrane bû, nema xwe girt, çû cem Sam û meselê jê re vekir:

“Rojbixêr ya pêhlewanê cîhanê! Xwedayê şev û rojan xwesteka dilê te bincîh anî, mizgînîya min li te, zarokek kurîn ji te re çêbû, tu êdî bûyî bav! Wê jina te ya rûheyv zarokek pîrûpak ji te re anî dunê. Lawekî bi dest û pê ye, mîna sakê gamêşê gir e, awurên wî tûj in duşube têjika şêr. Canê wî mîna zîv dibiriqe û rûyê wî weke rojê xweşik e. Bedena wî bêqusûr e, lê belê Xwedê nîşanek daye wî: Hemî mûyên canê wî spî ne! Ya mêrxasê bi nav û deng! Bi qismet û taliha xwe razî bibe!” Sam lezand,

Xwe bi alî haremê gihand,

Li kurê xwe yê biçûk meyzand!

Sosretek wuha nedîtibû,

Ecêbek wuha nebihîstibû!

Nihêrî li wî babaegîtî,

Nihêrî li pora wî ya spî!...

Ponijî û kûr fîkirî, careke din li kurê xwe nihêrî; ji xeynî rûyê sor, her deverên wî di rengê diranê fîl de bû. Li xwe nihêrî, dafên spî ketibûn porên wî jî. Di dilê xwe de vê bûyerê wuha nirxand: “Ez ji riya heq derketime, ji riya eql dûr bûme. Xwedê jî min ceza kir û lewma ecêbek wuha nîşanî min da!”

Çok da erdê, gilî û gazindên xwe li Xwedê kir:

“Xwedayê şev û rojan! Tu tenê ji qusûr û çewtîyan dûr î. Heke ez ketibim ser riya Ehrîmen, ez efû ji te dixwazim. Poşmanîya min qebûl bike! Bi vî zarokê porspî, ruhê min tarî dibe û ez fedî dikim. Xwîna min dikele, dipijiqe. Gava heval û hogir, kesên zîrek û rêvebir werin mala min û vê ecêbîyê bi çavê serê xwe bibînin, ez dê çawa bersiva wan bidim? Ev ne zarok e, lê dêw e! Ew dê gel tinazê xwe bi min bike. Heke li rûyê min nebêjin jî, wê piştî min di bin simbêlen da bikenin û bêjin ‘Xwedê zane ku jina wî li kîja mêrgê çêriyaye!’ Ez di bin dewsandina vê şermê de nikarim bimînim. Tevî bextê xwe yê reş, dîvê ez Zabilê jî û Iranê jî terk bikim. Bawerîya min ev e ku Şeyta^n Medyayê bona rumeta min di nav gel de binpê bikin ev zarok ji min re şandine.”

Rûyê wî sor bû û ket heyecanê. Bêrawestîn bîryar da: “Zarok ji holê rakin, bibin dûrî bajêr, li çolekê bavêjin. Bila teyr û turûd û rawur wî bixun da ez jê bifilitim!”

Xizmetkar û dergevan rabûn, zarok avêtin ser pişta hespê, çîya û daristan, çol û çolistan çûn. Wî birin newala şêran ku di bin qûntara çîyayê Elbûrzê de bû. Elbûrz çîyayekî asê bû, pozê wî digihîşt rojê, dûrî gund û bajaran bû. Teyra Sîmir li ser serê wî hêlîn çêkiribû.

Zarokê ku hêja qencî û xerabiyê, berf û şekir, agir û gizêr ji hev nas nedikir, bêdê û bêbav wusa sêwî li çolê mabû. Li wê newalê şêr hatin dora wî, di nav wan de dê^êrek jî hebû ku hêja nûh teliqî bû. Gava şêran ên^ kirin ku pitik bixwun, şêra mê nehişt, li ber sekinî û xwe jê re kir talde. Zarok jî ew gav dest avêt guhanê wê, dê^êr deng nekir û ew lê mijîya, bi vî awayî gocî bû. Piştî gocîbûnê, du şêrên din hatin û ziman bi dora lêvê xistin. Lê belê kurê Sam her destekî xwe xist gewrîya şêrekî û her duyan jî xeniqand. Dewr û zeman derbas bûn; şev hatin bi ser rojê de, dunya guherî, çile gihîşt buharê, buhar dest avêt ser milê havînê, demsal ji hev xeyidîn. Gur û rawur, baz û eylo li rex wî çûn û hatin lê belê rehm ket dilê wan, xwarin li xwe û wî parê kirin. Geh birçî ma, geh tî. Carna li pêçîya xwe mijîya. Girîya û haş bû, dîsa girîya û girîya hetanî qirika wî zuwa bû.

Teyra Sîmir ya çîyayê Elbûrzê, gava çêliyên wê birçî dibûn ji hêlînê pêşî bilind difirîya, paşê ji nav ewran xwe mîna şûrekî tûj berra newalan dida, carna bi nukulan û carna jî bi pencên xwe xwarin ji wan re hiltanî.

Ew roj jî xwe dîsa daqûlî berjêr kir, lê ji nişka ve nalîn û zarîna zarokekî berşîr bihîst. Warîn û qarînek wulo jê diçû ku, erd û ezman, çîya û zozan li ber dengê wî dihejîya. Sîmir dît ku dergûşa zarokê reben kevir e û pîrika wî ax e, ji birçîna li axê û tiliyên xwe dimije. Ne canê wî kinc dinase û ne jî lêvên wî şîre dayîkê. Erdek gurrî û ezmanekî bêsitûn dibe mala wî. Roj, bejnek an du bejn bilind bûbû, tîrêjên wê yên sincirî weke taya genimê havîne sor û zer bûbûn û êdî seridî bûn. Darekî an rawurekî jî li ber serê wî tunebû ku jê re sîyê çêbike, ew ji tava tûj biparêze. Teyra Sîmir ku xwe

û çêlîyan bi goşt xwedî dikir, nexwest zarok bixwe. Ji nava ewrên belek, mîna teyra qaqlîbaz ku êri^î masîyê deryayê dike wulo xwe daqûlî erdê kir, bi

pencên xwe yên zexm û tûj rahişt zarok û cardin firîya jor. Hetanî nava ewran bilind bû û ji çav wunda bû. Ew bir li ser pozê çîyayê Elbûrzê, li navenda hêlîna xwe danî. Mêvan bi çêlîyên xwe da nasîn. Çêlîyan jî qarîn û nalîna zarok bihîstin, jê nedexisîn û mîna birayekî xwe ew qebûl kirin. Hingîya girîyabû, êdî xwîn ji çavê zarok dihat; make û têjik li vî halê wî nihêrîn, dilê wan şewutî û jê hez kirin. Di demek kurt de hezkirina ku di dilê wan de wejîya, tiştekî pir ecêb bû. Hemî bi heyrana rûyê wî yê zêrîn bûbûn. Zarok di dewsa şîr de li xwînê dimijîya. Lewra Sîmir, nêçîra xwe ya xurt ji wî re cihê dikir.

Dem û dewran derbas bûn, Malbata Sam ew kur ji bîr kir. Riya kesekî jî bi çîyayê Elbûrzê neket û bi hebûna wî nehesîyan. Zarok roj bi roj mezin bû; bejna wî mîna spîndarê hilkişîya, sînga wî fîreh bû û werimî. Riya gelek karwanan di wî çîyayî re derbas dibû. Xwedîyê karwanan xortekî bejndirêj di hêlîna Sîmir de dibînin.

Şevek ji şevên payîzê dirêj û tarî, gava Sam di nava raman û xeyalên kûr de xays bû û nivîya, xewnekê dît: Xortekî çeleng ku ji Hindê ber bi alî bakur de diçû, li ser pişta hespekî Erebî bû, berê dizgîna xwe zîvirand û li bayê bezê xwe gihand cem wî. Jê re got “mizgînîya min li te, kurê te hêja sax e û li ser pozê çîyayê Elbûrz di hêlîna Teyra Sîmir de dijî.”

Samê Nerîman gava ji xew şîyar bû tirsîya û xwêdan da. Zuxrikê xwêdanê li ser enîya wî cemidîn. Lez kir, mûbîd û zîrekan, porspî û pîrekan li hev civand, xewna xwe ji wan re got û pirsî: “Hewqas sal û zeman, dem û dewran derbas bûn, gelo dibe ku zarokek berşîr li çolê karibe bi tena serê xwe li heyatê bimîne?”

Zana û şîretbêjan bersiv dan: ‘^êr û pilingên li ser taht û zinaran, masî û gamasîyên li bin avan, teyr û turûdên li ser dar û

12

devîyan, ev hemî çawa li têjikên xwe dinêrin û xwedî dikin? Ne heyfa te! Çawa yekî weke te pêhlewan be û fermandarê welatekî be, lê kurê xwe bavêje newala şêran! Ne eyb û ne fedî ye? Sedemî pora wî ya spî, te ew pitikê rebenê belengaz û masûm ji dergah û dîwanên xwe avêt. Rabe, lez bike û derê çolê, bi şev û roj nesekine û lê bigere. Suwaran bişîne, bila ser û binê çiyayê Elbûrzê lihevxînin.”

Axaftina wan li Sam tesîr kir. Dotira rojê, tevî leheng u suwaran, mêrxas û xizmetkaran kete rê, berê xwe da çiyayê Elbûrzê. Bi keserkûr û dilsojî, bi êşa wundabûna ewladê xwe, bi hêvîyek mezin gerîya. Vir de çû, wê de nihêrt. Geh bazda, geh lezand, betilî. Rûnişt, rabû û ponijî. Çiqas gerîya ewqas hêza hezkirina dilê wî zêde bû. Tarî daket erdê, lê bû şev, xwe li ser axê dirêj kir û nivîya. Çawa çavê wî çûn ser hev, li ser serê çîyayekî Hindistanê aleke çikandî dît. Bayekî honik û sivik li wê alê dixist û ew pêl dida. Li pêşîya alê zarokekî rûşêrîn hebû û li dû wî jî girseyek leşker rêz bûbûn. Li alî çepê mûbîdek û li alî rastê jî kalemêrekî jîr hebû. Extiyarê alî rastê hat nêzîk li Sam kir û bi ser de barîya: Hey bêînsafê kurê bêînsafa! Tu qet ji Xwedê natirsî? Piştî ku te kurê xwe hewcedarê teyrekî kir, ka mêranîya te li ku derê ma? Ger tu pora spî jê re dikî sûc û qebehet, ka pêşî li pora xwe ya ku roj bi roj mîna dara bîyê spî dibe binêre! Sal bi sal bedena te diguhure, lê tu nabînî! Kurê te parçê canê te bû, te ew jêkir û avêt, lê belê Teyra Sîmir ku wa ye hêlîna wê li ser pozê Elbûrzê ye, lê xwedî derket. Ma qey ji şifqeta bavîtîyê piçek jî para te neketîye?” Di xewa şêrîn de, mîna gurê pê di dafikê de qerîn jê çû. Bi dengê xwe re şîyar bû. “Çi xewnek kambax!” got ji xwe re. “Bobelatên mezin di pêşerojê de

werin serê min.” Tirsîya, bang li hemî zîrekan û remldaran kir. Ket heyecanê, ji qumandaran re got: “Şîyar bin!”

Dû re li hespê xwe suwar bû û çû ew newala ku berê kurê xwe avêtibûyê, cîhê şrran. Gava gihîşt wê derê, nihêrî ku çi bibîne! Pepûk, reben! Serê çîyê bilind e û hey bilind e, digihîje heta nava ewran. Roj û stêrkan dixwaze hilweşîne! Nihêrî ku wa ye hêlînek gelek mezin li ser pozê çîyê ye. Hêlînek wilo ku, darên wê ji kêranên dara ebenûzê û ginûyê hatiye çêkirin. Sam, li wan zinarên biheybet û li wê hêlîna ku mîna cîhê bênderekî fireh nihêrî. Baş bal û dêna xwe da Teyra Sîmir. “Ev hêlîn bi destê mirovan nehatîye çêkirin! Ne ji herrîyê ye ne jî ji kevir!” Çavê wî li jor û sitûkura wî bi pişta wî ve zeliqandî wulo demekî li hêlînê hûr bû. Dît ku xortek li rex hêlînê rûniştiye. Baş lê nihêrî; pora wî ji dûr ve spî dikir.

Dilê wî kizirî û xwîna wî kelîya,

Di cîh de rûnişt û girîya,

Axê bi xwe de kir, pora xwe kişand,

Bi ser ehmeqîya xwe ve kûr nalîya...

Çav sor û ser bixwîn rabû piya,

Li rêçekî an şivereyekî gerîya,

Vir de çû, wê de hat, doş bû Kir û nekir rê nedayê ew çîya.

Qet rê nedît ku ew hilkişe jor Li vî alî, geh li wî alî dor bi dor Keysa rapeliqandinê hîç nedît Rû çilmisî, girîya, kir ore or.

Dîsa rûnişt û çavê xwe girt, berê xwe da Xwedê: “Ya Xwedayê ji vê rojê û ji vî ezmanê bêsitûn mezintir! Ez serê xwe

14

li ber te ditewênim; min bibexşîne! Va ye ez li vê çolê! Tu çi ceza didî min tu zanî! Ger ev kur ji haveynê pişta min be, ne ji tuxmê Ehrîmen be, alîkarîya min bike da ez hilkişim jor.”

Ew gav, Sîmir li jêr nihêrî; di bin gelî de çend zilaman dît, fam kir ku ji bona xortê nav hêlînê hatine. Li mêvanê ku bi salan e di hêlînê de xwedî dikir zîvirî û wuha got:

“Di hêlînê de te ewçend zehmetî kişand,

Ez pîrika te me, min te bi xwînê mijand,

Bav te ceza kir, te ji nav malê avêt,

Lewma bila navê te bibe DESTANÊ ZEND.

Tu dê êdî bifilitî ji çîya, ji vê newalê,

Gava vegerîyayî û ku tu çûyî malê,

Şeref û rûmet li benda te ye êdî,

Bila kes nizanibe bi vê rewş û hewalê.”

Çavê kurê Sam bi van gotinan tijî bû; bû ewrê buharê yê dagirtî. Xwîzî di qirika wî de civîya, dilê wî hilpekîya. Hetanî wê rojê rûyê tukesî nedîtibû, lê belê Sîmir ew hînî ziman kiribû, wuha li Teyr vegerand:

“Hêlîn bo min bû miqamê pederçahîyê,

Te min hewand û xelas kir li ser çîyê,

Li jor Xwedê, li jêr tu mezinî ji min re;

Baskên te taca serê min a ronahîyê...”

Sîmir got, “Gava tu tac û text, zêr û zîv, şûr û xencera pêhlewanîyê bidestxînî, min jî û vê hêlînê jî tu dê jibîr bikî. Ez ji te ecz nebûm. Riya pederçahîyê wê li te vebe, lewma ez te

dişînîm. Ger tu li vir bimînî ji min re baş e, ger tu biçî ji te re baş e! Va ye, perrîyekî baskê min bi xwe re bibe. Di jîyana te ya pâşerojâ de gava tu ketî tengasîyê, perrê baskê min bavêje êgir. Ji bîr meke! Tu dê ew gav hêz û qudreta min bibînî! Ez dê mîna ewrakî reş û tarî dakevim erdê, xwesteka te bincîh bînim. Hezkirina te di dilê min de ye û tu jî min ji dilê xwe dernexe!" Piştre Teyr, Destanê Zend li ser baskê xwe suwar kir û ew hilanî, ber bi nava ewran ve bilind bû, çû û hey çû... Hetanî ji çav wunda bû. Sam jî li jêr bû û lê dinihêrî, got "Eywax kurê min cardin wunda bû! Qey ew bû melayîket û firîya?" Di demek kurt de, Sîmir mîna teyrê ku êri^î berate bike bi hêz xwe berra xwarê da û Destan anî, li ber Sam danî. Bav li kur nihêrî; pora wî gelekî dirêj bûbû, gijika wî ketibû nav hev. Bejna wî mîna fîlekî gir bû. Digel pora wî ya qirêjî, rûyê wî pak bû û mîna gula buharê geş. Dîsa qêrîn û orîn bi Sam ket û girîya. Paşê bejna xwe li ber Teyr tewand û wuha got: "Xwezaya pîroz ev hêz û sêhr bona tu alîkarîya kesên bêçare bikî daye te. Kesên ku xerabîyê bi te bikin bila malwêran bibin!"

Teyr firîya û ji ber çav wunda bû. Sam qenc dêna xwe da bejn û bal, şikl û şemal, çav û birûyên kurê xwe. Seranpê hûr hûr lê nihêrî. Dît ku;

Sînga wî sînga şêran,

Masûlk jî yên pilingan,

Rûyê wî rûyê rojê,

Awur yê cengaweran.

Dest û lepên wî êdî qevdika şûr digirt. Digel por, birû û bijang spî bûn, lêvên wî mercan bûn. Mûyên wî li ber tîrêjên tavê mîna zêr dibiriqîn. Sam, ewladê xwe yê xweşîk bihesret

16

himêz kir, “Lawê min yê delal!” got, “dilê xwe ji min neşkîne, rojên xerab û tarî li paş man, ji bîr bike wê tengasîyê. Ez bavê te me. Êdî ez tucarî xerabîyê bi te nakim. Hemî xwestekên te li ser serê min û li ser çavê min!”

Sam ew anî mal, pantorekî reş û ji hevrîşim, îşlikek ku bi zêr nexşkirî bû lê kir, kemberek fireh li piştê girêda, qame da destê wî û got “Şabaş ji te re, mêrxasê mala bavê mino hezar car şabaş! Ez navê ZAL li te dikim. Teyr te mezin kir, lewma tu xerabîyê nizanî. Ango dilê te jî mîna kincê te û pora te ji zêr e. Tu Zalê Zêrîn î!”

Kêf û coşek bi hêwurze ket nava mala wan. Sam ferman da, defa şahîyê lêxist, leşker û pêhlewan li hev civand. Eşqek di dilê wî de şîlan dabû; mîna ku Zal hêja nuh hatibe dunê, pîrozbahî li dar xist. Fîlan da pêşîya êlê. Dengê def û elbanan, zengilên zêrîn û sazbendên Hindê li her derî belav bûn. Hêlanên suwarîyan di bin toz û dûxana ku ji ber simê hespê wan bilind dibû de, digihîşt erçê ezîm.

Nûçe gihîşt Padîşahê Mezin, Şehînşahê Iranê Minûşîr. Gotin Samê Nerîman bi pîrozbahîyek şên kurê xwe ji çîyê anîye mal. Du lawê Minûşîr hebûn; Newzer û Zerhesp. Şah, bang li Newzer kir, got: “Zû bike bilezîne, barê karwanekî ji zîv û zêr dagre, digel sênîyên zîvîn kole û qewraşan, zumrût û fîrûzeyan, mihînên Erebî û tîr û kevanan jî jê re bibe û xwe bigihîne Qela Zabilê. Sam pîroz bike û bêje bila nesekinin, ew û kurê xwe werin. Ez dixwazim kurê wî yê ku di hêlîna Teyr de mezin bûye bibînim. Bila were ji min re qala xwe û Sîmir bike, ka hela çi teqe req dîtine, çi bi sera de hatîye.”

Gava Newzer xwe gihand ber derîyê Qela Zabilê, Sam bi leq de çû û xêrhatin tê da, ew himêz kir. Sam bi saxî û selametîya Şah dilşa bû, daqûlî erdê bû û axê maç kir. Di

demek kurt de Zal xwe amade kir, kincên pêlewana li xwe kir, hespek peyde kir. Ew, bavê xwe û çend pêhlewanan ketin rê, berê xwe dan Iranê bo serlêdana Minûşîr. Dotira rojê qeflê Zabilîyan gihîşt paytextê. Şah bona hurmet û rûmetê bide wan, artêş amade kir, ala Iranê li pêş çikand û derket. Sam gava çav bi ala bavê Newzer ket, ji hespa xwe daket û peyatî meşîya. Piştî ku hev û din maç kirin, Minûşîr, cardin Sam li hespê suwar kir. Dema gihîştin Qesra Mezin, Şah hilkişîya ser textê pederçahîyê û kumê ku ji bav û kalan de mabû, kişand serê xwe. Li ser milê wî yê çepê pêhlewanê bi nav û deng Karen hebû, Sam jî çû li alî rastê rûnişt. Zal, bi kumekî zêrîn û qatek cilê hevrîşimî xemilandî bû; wadê Şah ew dît şaş ma û di cîh de şeqizî. Berê xwe li alî rastê zîvirand û ji Sam re got:

“Xortekî mîna vî hêja nehatiye ser rûyê erdê. Bi vê bejn û bala xwe, bi vî rûyê delalî ruhê mirovan muferih dike. Şîreta min ev e, tucar wî neêşîne û dilê wî nehêle. Ne ji wî be, ûrt ûcaxê mala bavê te yê Neriman dê ji holê rabe. Baş lê xwedîtî bike, wî bişîne nêçîrê, ûsil û tevdîra şer û cengê jê re bêje, wî hînî bikaranîna hacetên herbê bike. Binêr:

Lepên wî yên şêran e,

Awur yên mêran e,

Pozê wî yê beran e,

Ew bi fikr û raman e!

Wî bi hewisîne, bila bizanibe di nava civakê de bijî. Rebeno heta niha ji xeynî hêlîna Sîmir, çîya û zinar, da’l û devî tiştek nedîtiye. Adet û toreyên civat û caxîyan nizane.”

Minûşîr rûyê xwe ber bi alî Zalê Zêrîn ve zîvirand: “Ka vêcarê dora axaftinê ya te! Ka bêje xwarzê, te çi dît û çi nedît?”

18

Destan qala çîyayê Elbûrzê û hêlîna Teyra Sîmir kir. Li wê der çi xwaribû û vexwaribû, roj û meh, demsal û sal çawa derbas kiribû ji serî heta binî ji civatê re got. Paşê bavê wî dora xeberdanê girt:

“Gava ez gihîştim çîyayê Elbûrz wê newalê Min dît hêlînek fireh, ji ebenûs wa li palê Lawê min yê porspî ku bi salan e nayê malê Tê de rûniştiye li ber wê germê li ber wê tavê.

Min zinarek dît serê wî digihîşt ewran Parçeyek kevir sekinîbû li jor, li ezman Çiya asê bû, bi tirs û xof û xeteran Poztûj û xelesemt, rê tune bû li wa deran.

Lawê min, ronîya çavê min bêtirs di nava hêlînê de rûniştibû. Jixwe ne xema wî bû jî! Bi têjikên Sîmir re weke xuşk û bira dijîya. Gava mirov li wê dîmenê dinihêrî, bêhna hezkirinê diket pozê mirov. Niha jî mûyê canê min radibin. Ez li çar alîyên çîyê gerîyam, lê min tu rê nedît bo hilkişim. Bêçare mam, keribîm bi ser halê xwe de û girîyam. Şahê min! Tu jî zanî heta niha kur ji min re çê nebûne, lewma hesreta wî mîna ava deryayê di dilê min de dipijiqî. Ha ku min nedît, ez li ser çok ketim û min hewîş kir:

Ya Xwedayê dilovan!

Ew parçeyek ji kezeba min e,

Duaya min qebûlke Ew ji min re bişîne,

Wî xêr ji xwe nedît,

Bêexlaq û hezkirin e,

Bi posté heywên mezin bû,

Li xwe nekir hevrîşime.

Şîr tam nekir, li pêçîya xwe mijîya,

Mijûl nebû, têr neleyîst û negerîya,

Bi xwînê gocî bû, girîya û hey girîya...

Kêlîya min duayên xwe xelas kir, Sîmir ji hêlîne firiya, ez ew gav pir tirsîyam. Gelo kurê min çû jor û bû melayket? Lê belê di demek kurt de Teyr bi şûn de hat, li ser serê min doş bû û ji nişka ve xwe berra erdê da, xortê ku li ser baskên wê bû anî, li ber min danî. Bêhna buharê, misk û emberê ji per û baskên wê dihat. Çavên min jî bi lêvên min re zuwa bûbûn; êdî rondik jê çikiyabûn. Devê min ji tîna miçiqî bûbû. Teyra Sîmir hiş û eql ji serê min biribû. Gava wê kurê min anî û li rex min danî, min got qey ew melaykete û ez jê re heyran mam û min sucde kir. Paşê tavilê firiya û mîna pîrebokan ji ber çav wunda bû."

Piştî Sam gotina xwe xelas kir, Minûşîr bang li remildar û falbêjên stêrkan kir, got " Werin! Zû bicivin û li pêşeroja vî xortî, vî egîtî binêrin!"

Remildar û falbêjan yeko yeko li remla Zal nihêrîn. Dîtinên xwe pêşnîyazî Şah kirin û nirxandin:

"Ya xwedîyê tac û textê zêr!

Me qenc nihêrî li fala Zalê Zer,

Gava mezin bibe ew bi xêr;

Wê bibe pêhlewanekî bikêr!"

Ji Minûşîr re mizgîn bû ev. Lewra pêdivîya wî hebû bi şervanekî baş. Hespekî Erebî ku zînê wî ji zêr bû ji Zal re anî. Paşê şûrekî Hindê ji gencîneyê derxistin, kalanê wî ji zêr bû. Malên gazê yên hevrîşimî û xalîçe, aqût û zîv, carîyeyên Rûmî ku di nava kincên bi zêr nexşkirî de xemilandî bûn jê re dîyarî kir. Dor hat ser hacetên herbê; tîr û kevan, zerx û gurz, mertal û riman li ber wî danîn. Textekî fîrûze, tac û kembera zêrîn,

mohreke ji aqût deranîn, li ser barê devê bincîh kirin. Dû re, Minûşîr bona biryara herî nirxîn û girîng eşkere kir:

“Ez ji îroj pê de, bajarê Kabîlê û Denberê, welatê Hindê û hetanî bigre Derya Sindê, ji Derya Çînê hatenî Zabilistanê û bajarê Bûstê dixim bin hîmaye û rêveberîya Samê Nerîman.” Dema vegerê hat, hespê Sam anîn. Bavê Zal berî ku suwar be û bi rê keve, bo Minûşîr çend gotin anî zimên:

“Ya padîşahê birêz û adil! Di nava kesên xwey tac û text de, mirovên mîna te hene gelo? Hemî gencîneyên ser rûyê erdê li pêş çavê te ne tiştek in! Tu merd î û camêr î! Hêvîya min ji Xwedê heye ku ev tac û text bi sermedî bimîne!” Piştî ku Sam text jî maç kir, gurmîna dengê defên şahîyê bilind bû. Êla Zabilîyan derket rê, berê xwe dan welatê xwe.

Nêzîkî bajarê Zabilê gundî û bajarî, pîr û ciwan, qîz û xort leq wan de hatin. Lîlandin hey lîlandin, pêhlewanê cîhanê di gul û sosinan de xemilandin. Sîstan, mîna bih^tê di misk û emberê de kemilandin. Li her cîhî zêr û zîv reşandin. Gotin: “Şabaş ji Xwedayê şev û rojan re! Tuxmê Nerîman ji holê ranebû, malbata pêhlewanan dîsa zîl da! Sam warreş neçû, hemd ji Xwedê re çira Keyanîyan wê êdî vêketî bimîne li dunê!” Zaro û zêç, jin û mêr, pîr û pîrek di nav ş^yeke boş de reqisîn, Sîstanê seranser kirin mala dawetê.

Şox û şeng qediya, herkes vegerîya mala xwe. Hefteyek bi şûn de, Sam meclisa jîrik û rêvebiran li hev civand, gazî zana û porspîyan kir û ji wan re axifî:

“Dema min Zal bir cem Minûşîr, wî bi dizî ferman da bona ez artrşr bicivînim û amade bikim. We hay jê heye? Li welatê Medya, şeytanrn hukumdarê Mazenderanê yên ku serê wan dişube serê sîsarikan û dêw û pêhlewanên Gurksaranê welat şewutandin, bajar û gundan wêran kirin, erz û eyalên xelkê li ber dest û piyan birin. Ez dê herim welatê Medya.

Hun li Zal miqat bin. Ew parçeyek ji canê min e û ji xwîna min e! Emanetî Xwedê, emanetî we ye. Ew dê perwerde ji we bibîne. Hûn dê pêşîya wî ronî bikin. Şîretan lê bikin û bila riya meznahîyê bielime." Dû re destekî xwe danî ser milê Destan; "Kurê min! Ez welat teslîmî te dikim. Comerd be û qet miraqa min neke, bila dilê te rihet be. Tucar ji bîr meke ku êdî Zabilistan di bin fermandarîya te de ye. Mal û xana te ji ya herkesî xweştirîn e. Bila heval û hogirên te jî bi bextewarîya te şa bibin. Ev e, hemî miftên gencîneyan li ber te! Di cengê de jêhatî be, di şahîyê de dilevîn! Remildar dibêjin tu dê bibî xwey tac û text. Em mecbûr in ji çerxa felekê re sitûyê xwe bitewînin. Suwarî û şervanan, jîrik û mûbîdan li dor xwe bicivîne. Guhê xwe bide wan.

Tu leheng î, mêr î,

Ji maleke têr î,

Mîna şêrê nêr î,

Ji axa zêr î.

Lawo! Merd be, dîyarîyan bide kesên dora xwe. Dubendîyê nexe nava qewmê xwe. Bizanibe ku, neyarekî zîrek, ji dostekî ehmeq çêtir e."

Zalê Zêrîn bersiva bavê xwe da:

"Lo lo bavo! Ez im ku di hêlîna Teyra Sîmir de mezin bûme, dê çawa bêyî te karibim bijîm? Gelo ji bilî min kesek heye ku ji diya xwe sûcdar çêbûye? Ez çiqas feryad û fîxan bikim, dîsa qîm nake. Te çawa di zarotîyê de min tenê hişt, niha jî dîsa tu min tenê dihêlî û diçî. Wextakî ez bi teyr û turûdan re mam ji te dûr. Niha jî fermana Şahê Iranê te ji min cihê dike. Ez çawa bikim? Li enîya min wuha nivîsiye; ji gulê tenê sitirî para min dikeve!"

Gava gilî û gazind, şîret û nesîhet xelas bûn, def û zengilan dîsa lêdan; gumîn û şingîn li erd û ezman belav bûn. Rûyê axê guherî rengê hesin, ewr jî bûn rengê ebenûzê. Ji dehlîz û bircên Qela Zabilê dengê zengilan û defdefkên Hindê hat. Sam û artışa xwe, di bin van dengan de berî ku derkevin rê, bav û kur hev û din helal kirin. Çavê Zal tijî hêstirên xwînî bû. Di nava fikar û xeteran de hat malê. Mîna ku bavê wî gotibû; bi dilekî aram çû li ser text rûnişt. Textê ji diranên fîl xweş lê hat û taca biriqokî li sera rûnişt. Bazin, gerdenî û kembera zêrîn li xwe ediland. Rahişt gurzê di şik^ serê ga de, çend car teqiland. Dû re bang li jîrik û porspîyan kir, bi wan re axifî, derheqa pirsgrêkên welêt de agahî ji wan girt.

Roj û saet, dem û dewran, çile û bihar derbas bûn. Sam li welatê Medya û Gurksaranê, kurê wî jî li Zabilistanê ma. Zalê Zêrîn bû pêhlewanekî jêhatî û rêvebirekî ilmdar û zana. Bû pisporê suwarîya hespan, şervanekî bi dest û pê û wêrek. Gelek caran bi pêhlewanên Turanî re cengê li dar xist. Car caran, qet şûr nexiste kalan.

Rojekji rojan,

Rihme li dê û bavên hazir û guhdaran,

Zal derket gerê, tevî egît û pêhlewanan,

Kabîl û Denber, Murg û May nehişt,

Gihîşt ku derê sing çikand û text vegirt.

Ji Zabilê bi rê ket, hetanî Kabîlê hat. Bi rê ve, çewalên zêr û zîv vekir, gencînê li gel belav kir. Şerab vexwar, ji bin konên êla wî dengên saz û tenbûr, rûd û neyê kêm nebûn. Kabîl bajarekî xweş bû. Çiyayên Hîndûkûşê ku havînê jî berf jê xalî nedibû li pişt şehr pozê xwe bilind kiribû. Qralê vî bajarî Mîhrab bû, yekî pir zengîn û bi xwe jî pêhlewan bû. Minûşîr vî bajarî jî xistibû bin fermandarîya Sam, serokê Kabîlê her sal bacê dişand Zabilê. Mîhrab bi eslê xwe Asûrî bû û ji nesla Dehhaq bû.

Gava Mîhrab bihîst ku Zalê kurê Sam gihîştiye nêzî bajarê Kabîlê, tavilê ferman da bo qesrê bişonin û bajêr bixemilînin. Qewraş û kole, dergevan û pêhlewan hemî ketin fikaran, vir de wê de lezandin. Kuçe û sûkan pak kirin. Barê hespan bi zêr û zîv dagirtin, paşê misk û emberê, aqût û almastan, qumaşên bi zêr neqişandî, taceke zêrîn ya padîşahan, gerdenîyek zêrîn ku bi zebercet nexşkirî bû û kurk û abayên ji hevrîşim ji Zal re amade kirin. Mîhrab, tevî serokên qebîleyên

Semîtîyan bi leq Zal ve çû, ji hespa xwe peya bû li ber Zal çok da erdê, hemî yek bi yek şopa simê hespê Zal maç kirin. Dû re, Ew û Zal bi hev re hilkişîyan qesrê, rex textê fîrûze.

Ew roj, mazûvan ji mêvanan re bezmek bona şox û şengê amade kir. Sîtilên goşt û birincê kişandin ser êgir, kûpên şerabê hatin vekirin. Rûd li alîyekî lêxist, dengbêjan pêçî xist guh, meygeran stekanan dagirt û belav kirin. Kêfa Zalê Zer ji wan re hat, di dilê xwe de got: “Gelê Semîtî ji mêj ve ye bi îranê ve girêdayiye. Sebebek ji vê yekê re heye. Mîhrab mirovekî zîrek dixuye, prensekî bifam e.” Di şevbêrkê de qerfan gotin, henekan kirin, bi hev re kenîyan û serpêhatîyên xwe anîn zimên. Zal û Mîhrab bûn dostê hev.

Di wê civatê de serokekî eşîran devê xwe bir ber guhê Zal û bi pise pist jê re wuha got:

“Ya padîşahê cîhanê! Keçek Mîhrab heye ku hûrîleyn jî ne wusa ye! Karxezalek weke wê nehatîye ser rûyê erdê. Heta niha piştperde maye û rojê jî rûyê wê nedîtiye. Xweşikiya wê li tukesî nîn e. Xortên ku çav pê dikevin, di wê kêlîyê de ne bi dilekî, lê bi heft dilan pê ve tên girêdan. Navê wê Rûdabe ye, lê belê tu li navê wê nenihêre, ew rû nade tukesî!

Canê wê pir tenik e,

Mîna heyvê dibiriqe,

Bejna wê spîndar e,

Rû sor e, wek hinar e,

Por li panîyê xirxal e,

Memik sêv in,

Sîng jî zozan e.

Pîra wê di seraya Dehhaq de temenê xwe derbas kir, ew carîyeya wî bû. Dereng nemîne; Xanedanê Çînê dixwaze wê ji xwe re bibe. Bêhna miskê ji pora wê ya direj tê bi Xwedê!”

Zal ew şev raneza, xew neket çavê wî, heta sibehê şikl û şemala Rûdabe xeyal kir; eql û îzan pê re nema. Di bin konê xwe de, li bin taveheyvê li çem nihêrî û kûr ponijî. Dema tavzêrîn rimên ji tîrêjan li ser pozê çîyayê Hîndûkûşê de çikand, rûyê axê mîna kamfûrê spî bû. Mîhrab hat bin kon û li xwestekên Zal pirsî. Kurê Sam jê yek tiştek xwest: “Tu û malbata te, tevî alîgiran werin Zabilê, bibin mêvanên min.” Mîhrab li pêşî û paşiyên xwe fikirî:

“Mîrê min, hêja zû ye. Me hêja nuh hev nas kir. Ji alî din ve jî, bavê te destûr nade. Tê bêjî çima? Niha ew bibihîze ku tu bi me re şerabê vedixwî û li Kabîlê di nava pût û senemên Semîtîyan de cîh digrî, ew dê gelekî hêrs bibe. Nevîyên Kawa kengê ji malbata Dehhaq hezkirine?”

Zal hêja Rudabe nedîtibû, lê belê mirak û mitale dikir, teqlên xwe dida ber hev, xays dibû û di nava ramanan de wunda dibû. Dilekî wî jê re digot vê meselê ji Mîhrab re zûka eşkere bike, Mîhrab ne zilamekî xerab e. Heke ew bibe xezûrê min, di vê herêmê de êdî kî dikare serî li ber min hilde? Lê dilê din digot na, zewac ne tiştek baş e. Jin mirov bêrûmet dikin, ger ez bixwazim di cîhanê de bibim desthekatdar û mêrxasekî bi nav û deng,

divê nezewucim. Pêşîya gotiye: “Jin heye mirova ra dike û jin heye mirov rezîl û ruswa dike!” Demekî wulo dudilî û bêbiryar ma.

Çend meh buhurîn, rojekê Mîhrab sibehê zû ji oda xwe derket, daket alî haremê. Rast li Rûdabe û diya wê Sînduxt hat. Her du jî xweşik bûn û bêhna xweş, bêhna baxçê bih^tê ji wan dihat. Mîhrab li wan sekinî û methê qîza xwe da. Taceke ji

26

emberê li serê wê bû. Di nava fîstanê hevrîşîmî de xwe li ba dixist. Bi zîv û zêran xwe xemilandibû. Sînduxt jî mîna dara sincê bû; bi nazenînî lêvên xwe vekir: “Roja te bixêr be, destê xerabî û bêbextiyê dûrî te be mîrê mîran! Tu îroj çawanî? Dixwazim tiştekî ji te bipirsim: Min li gelek cîhan nav û dengê kurê Sam bihîstiye. Dibêjin xwedêgravî ji zikmakî de ew porspî ye. Gava hûn tên cem hev, ew qala çi dike gelo? Behsa tac û textê pederçahîyê dike, an qala hêlîna teyr dike? Hînî tevgerên mirovahîyê bûye? Zane weke însanan rabe û rûnê? An xuyên çivîkê pê re hene? Mîna teyr diqîre an na?”

Mîhrab bi pirsên wê yên vêtik û xêtik ecz bû, tengazerîya xwe wuha anî zimên:

“Tu çawa dikarî wuha bêjî? Ne heyfa Zal ku tu derheqa wî de tiştne beletewş dibêjî? Sîngzêrîn û bejnspîndara min! Li ser ruyê dunê, kesekî heye ku karibe milê Zalê Zer deyne erdê? Kesekî ku qevdika destê wî bitewîne heye gelo? Di nava suwarî û pêhlewanên Zabilê de mêrxasekî mîna wî nîn e. Di hêlîna çivîkê de mezin bûye, lê belê dilê şêr pê re heye! Lewma bavê wî, gelek welat xistiye bin fermandarîya wî û mifta gencînê daye wî. Xortekî gelek comerd û destvekiriye jî. Li ser textê xwe zêran

belav dike, lê di cengê de jî serîyan! Hişyar û jîndewar e. Dema şer li dar dikeve, li ser zînê hespê dibe ejderhayek neynoktûj.

Gava dikeve şer û cengê,

Dûman radike ew ji erdê,

Kela dil bi xwînê divemirîne Li çar alî rim û xencer dibarîne

Ew xortekî pir bi nav û dengi ne,

Ji xeynî pora spî tu qusûra wî nîn e.”

Rûdabe deng nedikir, lê belê bi balkdş guh dida bavé xwe. Gava behsa bedewî û egîtîya Zal bû, di rûyê wê de xwîn civiya, mîna kulîlka hinarê sor û kurr bû. Hezkirinek hêdî hêdî di dilê wê de vedijîya, digel ku hêja Zal nedîtibû jî. Şevek du şev bi meraqa dîtina wî niviya. Dema ku Zal hatibû Kabîlê, qewraş û xizmetkarên ku ew dîtibûn xwe gihandin Rûdabe. Jê re qala kurê Sam kirin: Çepildirêj û navmilpan... Awurtûj e, bi hes û jan... Çend roj derbas bû, Rûdabe êdî çavê xwe li Zal gerand, dîtina wî bû meraq jê re. Lê mixabin Zal jê dûr bû. Hes û heves ketin dewsa fikr û ramanan. Çûndin û hatin, rabûn û rûniştina wê guherî. Pênc qew^ên wê hebûn, her pênc jî Tirk bûn. Nema karibû wê nepenîyê veşêre; dilê xwe ji wan re vekir:

“Ez dê gilîyekî xwe li we parê bikim. Hun bi tenê ne xizmetkar in, herwuha rêhevalê derd û kulên min in jî. Dilê min dikele van rojan. Dilê min mîna têjika kero ku hêja nuh ji hêkê dertê, bi xwesteka dîtina Zal dipirpite. Ka nav lê bikin ev çi ye? Ez divêt dil û canê xwe ji vî ezabî felat bikim!”

Qewraşan gava ev bihîst, hema zûka ji cem wê rabûn. Yek ji wan di şêmûka derî de rawestiya û wuha got: “Ya taca serê hemî jinên cîhanê! Qîza qesr û qonaxan! Tu di tarîbana şevê de mîna gustîlkek ji aqût û almast dibiriqî! Ji Hindê hetanî Çînê tu têyî naskirin û ecibandin. Ne di nava daristanan de selwêyek mîna te, ne jî di nava stêrkan de stêrkek

mîna te heye! Gelawêj jî li ber te tîrêj nade! Em ji te pir hez dikin, lê belê dilê me ji te şikiya. Tu bi kîja eqlî qala wî kurê Sam yê beradayî dikî?

Li vê eyb û vê fedîyê!

Ew hov e mezin bûye li çiyê,

Bavê te te dixapîne,

Tu guhê xwe qet nediyê!

Bavê wî ew avêtiye ji malê,

Tê çawa xwe tazîkî, herî balê?

Bi çi rûyî tê wî têxî paşila xwe,

Ew malxwe, tu jê re bibî yarê?”

Rûyê Rûdabe bi carekê re tirş bû, enîya wê qermiçî, van gotinan hêrsa wê rakir. Hema ji cîh barîya bi ser wan de: “Qereçîno! Parsekno! Dizno! Hûn ne kesên ku mirov guh bide we! Ez ne hewce me li rûyê we binêrim lê! Piştî ku dilê min ket stêrkekê, ka ez karim êdî bi heyvên tarîgewrik ewle bibim? Gidî, gidyano bêjin hela; gul ji herrîyê ne çêtir e? Lê belê kesên ku hînî xwarina herrîyê dibin qet li gulê nanihêrin. Kezeba we bi sirkê aram dibe. Lewma hunguv wê derdê we biarîne! Min ne împaratoran, ne şahan, ne jî xanedanan divê. Kesê ku masûlkên wî yên şêran, sermilên wî yên pilingan be, ez dixwazim. Zalê kurê Sam mêrxasekî wuha ye. Bila xelk jê re bêje ‘pîro’ an jî ‘kalo’. Xema min xelk e ? Bila ji xeynî wî kesek di dilê min de cîh veneke. Li cem min qala tukesî nekin êdî. ^tê ecêb ev e ku, berî ez çav bi wî bikevim, muhuba wî di dilê min de hêlîn çêkir.”

Qewraşan serî pêl kir:

“Qencî û xerabiyê tu ji me çêtir zanî! Em ji dil û can bi te ve girêdayî ne! Tu terhik û şîlana dilanî! Bi hezaran carîyeyên mîna me biqurbana te

dibin! Ger tu pêşeroja xwe dixwazî hîn bibî, em dê reml bavêjin, ger tu sêhrê bixwazî em dê bi çivîkan

re bifirin, mîna xezalan bibezin, dermanê dilê te li erd be an li ezman be em dê bibînin. Em dê wî hizretî bînin li rex heyvek mîna te deynin û cîhê wî li cem te çê bikin."

Bi van gotinan re lêvên ji aqût bişirîn, rûya spî li ser mil ve li ba ket û zimanê hunguvîn libitî: "Heke hûn qencîyek wulo bikin, herwekî ku hûn dareke fêkîyan biçikînin."

Carîye ji cem wê rabûn û çûn oda xwe, canê xwe bi qumaşên Hindê rapêçandin, bisk û kezîyên xwe bi gulan xemilandin, bi reng û bêhnan guherîn. Derketin rê.

Meha Rêbendanê bû, her sal wan çaxan Zal ji Qela Zabilê derdiket, li ber çem kon vedigirt, qerargeh pevdixist. Carîye çûn qeraxa wî çemî û li vî alîyî ji xwe re ewle bûn, kêf û henekan kirin. Gav bi gav xwe gihandin nêzî çadira Zal. Fermandarê Zabilê ji ser text wan dît, gazî parêzgeran kir, got " Ew kî ne, çi kesin ji ku tên, diçin ku?" Koleyek (ku navê wî Rîdek bû) tavilê çû, xwe gihand wan. Paşê hat ji Zal re got " Ew ji qesra Mîhrab in. Dibêjin Rûdabeya qîza Mîhrab me şandiye vir."

Navê Rûdabe, bi carekê re heyecana Zalê Zêrîn ji cîh hilpekand, dilê wî yê melûl bi firê xist. Xwe li ser text negirt, eşqa nava wî keliya, veciniqî û rabû piya. Rîdek girt cem xwe û çû qeraxa çem, li wur peyase kir. Gava bala carîyeyên Kabîlî kişand ser xwe, ji kole tîr û kevan xwest. Milê xwe hilda. Li ser avê werdekek dîtibû, berê kevanê da wur. Kole kir qêrîn û barîn, hêwurze derxist bona werdek bifire. Kêlîya werdek basik li hev xist, Zal tîr weşand ser. Werdeka ku hêja bejnek bi hewa neketibû, serserkî ket nav avê. Bi xwîna wê qursek av şolî bû. Zal ji Rîdek re got "Here wî

alîyê avê, wê werdeka birîndar ji min ra bîne.” Kole li kelekê suwar bû û çû cem jinên Kabîlî. Yek ji wan bi Rîdek re axifî:

“Ew seydvanê werdekan, nijdevanê çolan kî ye? Padîşahê kîja welatî ye gelo? Bi Xwedê kesek ji neyarên wî nikare li ber tîra wî bisekine! Min di emrê xwe de nêçîrvanekî wuha îzbandût û awurtûj nedîtibû heta îroj.”

Rîdek bi vê gotina keçikê re lêva xwe ya jêr gez kir û hêdîka qewîtî lê kir:

“Nebî, nebî Keçê! Tu li cem wî wuha nebêjî ha! Ew ne nêçîrvan e lê, padîşahê welatê Nîvrojê ye, Zalê kurê Sam e! Heta niha çerxa felekê li ser serê wî qet negeriyaye. Dem û dewran, hêja ji mêrxasekî wuha kezeppola re nebûne şahid.”

Keçikê lê vegerand:

“Wuha nebêje kuro! Li qesra Mîhrab heyvek heye ku, Şahê te li hember wê nabe telpek ewr jî! Ez bawerim, xwedîyê te hêja yeka wuha xweşik nedîtîye. Bejna wê taya rihanê, canê wê yê spî mîna pembo ye. Xwedê tacek ji miskê çêkiriye û daniye ser serê wê. Çavên wê mîna zeytûnê reş in, birûyên wê jî eynî wê kevana destê Padîşahê te! Poz qelema zîvîn e. Bisk û kezî kurîşk kurîşk in. Çavê wê bi mexmûr û sermest dinihêrin. Devê wê ewçend biçûk e, nefes jî di nava lêvên wê de nanizile. Em ji Kabîlê, hatin cem padîşahê Zabilê, bona wan lêvên xweşîk bi yên kurê Sam ve bigihînin hev!”

Rûyê Rîdek sincirî, destên wî lerizîn. “Heke felek biryara zewaca wan dabe, jixwe xeberdan ne lazim e, ew dê hezkirinê jî têxe dilê wan. Teyrê başok ji teyra başok ya qupketî re wuha gotiye: Baş li hêkên bin baskên xwe binihêre; tu dê ji wan hêkan çêlîyekê derînî. Lê divê tu ji hêka ku haveynê bavê te ketiyê çêlîyê derînî.”

Rîdek devliken û i^êrîn vegerîya bin kon. Zal jê pirsî: -Devê te gazekî ji hev vezeliyaye, çima lawo? Wan çi ji te re got?

-Zewaca we dixwazin. Dilê wan heye.

-Madem wulo ye, here cem wan bêje bila li nav baxçe xwe bigewgirînin, neçin. Ne tenê gul û kulîlkan, bila zêran jî bicivînin: ez dê devê gencînê li wan vekim. Gotinek min ji Rûdabe re heye, bila bêyî min venegerin Kabîlê.

Zal ji gencîneyê zîv û zêr, dirav û almast û qumaşên hevrîşim ku bi zêr xemilandî bûn deranî. Koleyan ew birin dan carîyeyên Kabîlî bona teslîmî Rûdabe bikin.

Zal rabû... Zal hizirî... Zal hêdî hêdî ber bi baxçe meşîya. Gava keçên mêvan çav pê ketin bejna xwe tewandin, dû re erdê maç kirin. Zal rewşa Rûdabe ji wan pisî:

Bejn û bal,

Sîng û ber,

Xizêm û xirxal,

Por û rû,

Çav û birû...

“Rastî çi be bêjin. Ger tiştên ku hûn bêjin rast derên, wê bawerîya dilê min bi we zêde bibe. Lê ger ez ji we têkevim şikê, ez dê we di nav simên fîlan de bipelçiqênim.”

Bêdengî çê bû; serê xwe berjêr kirin. Keçika herî biçûk wêrekî kir:

-Mîrê min !Tu ji maleke têr î, ji axa zêr î! Kesek mîna bavê te bi nav û deng nîn e. Û tukes weke te cegerpola û bi dest û pê jî nehatiye dunê. Keça Mîhrab jî seranpê ji gul û yasemînan hatiye çêkirin. Rûyê wê weke stêrka

sibê ye, heta bigre şivan û gavanan herkesî ji xewa şêrîn şiyar dike. Bêhna miskê tim difûre ji biskên wê. Ji soraya wechê wê şerap diherike. Pora

dirêj kemend e, pê kemîn davêje pêşîya xortan. Li Çîn û Maçînê jî kesek wuha xweşik nîn e mîrê min!

Zal devê xwe bir ber guhê keçikê:

-Ka bêje, ez dê çawa xwe nêzîkî wê bikim? Dilê min bi evîna wê tijî bû. We dil ji min bir! Weke heyva bin ewr bila yek carekê rûyê xwe nîşanî min bide, bila dû re dîsa wunda bibe.

-Ger tu bixwazî, em dê niha biçin li rê. Em li hêvîya biryara te ne. Kesên ku pezn û salûxê te li cem wê dîlberê bide em in. Miraq meke, em dê dilê wê jî jê bidizin bona te. Her tişt bila bi urf û adetên dunê be, em dê lêvên we bi hev ve bihelînin. Lo lo mîro, tu çi sekinîyî?

Rake kemendê,

Dafik bavêje pêşiya wê lewendê.

Piştî ku jinên Kabîlî vegerîyan welatê xwe, Zal ew şev raneza. Şev qasî salekî dirêj bûbû!

Gava cariye gihîştin ber derê qesra Mîhrab, dergevan ewan negirt hundir. Bi ser wan ve qêrîya:

-Hûn çima bêdestûr derketin der?

Jinan wuha bersiv dan:

-Buhar hatiye, em gul û pîvokan ji gulîstanê dicivînin. Miraq neke, şêr me nabin û gur me naxun! Em bi destûra Rûdabe derketin. Bi çi kul û tadeyî ji nav devî û sitirîyan em gul û kulîlkan dicivînin ji prensesê re, tewer tu jî bi me re dixeyidî!

Dergevan:

-Iroj ne roja gul û sosina ye. Dibêjin pêhlewanek hatiye nêzîkî Kabîlê navê wî Zal e. Leşkeren wî gelek in, tu xwelîyê bavêjî li erdê nakeve. Ew destbirakê padîşahê me ye. Mîhrab rojê du-sê caran ji qesrê dertê û diçe cem wî. Heke ew tevî wan gulan li we rast were, ew dê ji min re çi bêje, ez dê çawa cewaba wî bidim? Ew dê we jî li erdê raxe. Hûn dê çima têkevin devê

gel, bibin mijara fesadî û gelaciyê? De zû bikşin hundur. Carek din ez we nebînim ha!

Keçik ketin qesrê, gava çav bi Rûdabe ketin, lîlandin:

“Me şrrekî mêr wulo,

Nedît hetanî îro,

Serî spî, rû jî sor,

Bejna wî dara bi çilo!”

Dilê Rûdabe hilpetikî, xwestekên wê kûr bûn û di mêjîyê wê de cîh vedan. Qewraşan zêr ji tûrik û paşi^n xwe derxistin. Berî ku birjînin ser xalîçê, prensesê pirsî:

-Ka hela bêjin; wî çi got û we çi bersiv da? Yekî çawa

ye?

Qewraşa biçûk:

-Ew suwarekî wulo ye, bi birûskê re dibeze. Nîşancîyek weke wî nehatiye dunê; li ber çavên me werdekê ji hewa anî xwarê. Sînga wî fireh e, bejna wî gelek dirêj e. Çavên wî di rengê avê de ne. Rûsor e û lêvmercan e. Zend û bendên wî mîna yên şêrekî stûr in. Biskên wî yên spî ku bi ser enîya wî ve dişiqitin, mîna tîrên zîvîn dibiriqin. Jixwe ew pora spî wî xweşik dike, pora reş wê lê neyê. Me mizgîna te da wî ku kengê bixwaze dikare te bibîne. Gava em jê dûr ketin, dilê wî bi hêvî bû.

Rûdabe şaş mabû. Pirsî:

-Kesê ku Teyr ew xwedî kiribe, çawa dibe pêhlewan û rûxweşik? Divê ez bi çavên xwe Zal bibînim. We peznê min li cem wî da û bi vî awayî ew xapand û jê diyarî sitend, ne wulo? Yek ji we îşev here bersiva min bide wî, bêje bila nesekine were.

34

Rûdabe qew^ekê şand, piştre dest bi amadehîyan kir. Oda xwe xemiland, bi dîwarên odê ve vêneyên fêris û pêhlewanan hilawist û her cihî bi qumaşên Çînê seranser raxist. Sitekan û kevçî, teyfik û tepsîyên zîvîn deranî. Şerab û misk û emberê tevlîhev kir, eqîq rijand erdê. Li alîyekî gul û nêrgiz û reyhan, li alî din jî yasemîn û kuncî reşand. Stekanên zêrîn bi ava gula tijî kir. Bêhna xweş li çar alî belav bû.

Qîza Mîhrab, mîna heyva çardehrojî ku di pişt ewran de serî hildide derket şaneşî^. Gava Destan li ser hespê kihêl xuya kir, Rûdabe bang lê kir:

“Tu bi xêr hatî ya xweşmêr kurê xweşmêra! Li ser sera, ser çava! Destê Xwedê li pişta te be û piyê te jî li ser pişta feleka xayîn be! Bila şevên reş û tarî bi rûyê te spî bibin!”

Dema Rûdabe wuha axifî, qewraşan li eywanê bi hev re lawjen gotin:

“Me şêrekî mêr wulo,

Nedît hetanî îro,

Ser spî û rû jî sor,

Bejna wî dara b’çilo...”

Zal serê xwe rakir û li jor nihêrî. Du roj dixuyan li jor, banê xênî ji şewqa ya şaneşî^ bûbû kakilê zebeşê sor. Xwe negirt:

“Lê lê zerîyê! Heyveronaya te gerdûnê guhert rengê zîv. Silav ji te re, ji meznaya te re! Di şeva heyveron de dem ji biriqandina stêrkên ser avê re nîn e; ew ne tenê xwe, lê hemî şevan bi xwe re dibiriqînin. Ji roja ku min navê te bihîstiye, ne roj bi min roj e, ne jî şev şev e. Xewên şevan li min hisret e.

Hêvîya min ji Xwedê bû ku carekî tenê rûyê te nîşanî min bide. Niha ez bi vî dengê te yê nazenîn û ziravbihîstiyar hêç bûm.

“Tu li jor, lê ez li jêr,

Em dê bigihên hev bi xêr,

Ew gerdena te ya bi zêr,

Ez dê maç bikim têr û têr!”

Prensesa Kabîlê li şaneşînê xwe xwar kir, xêlîya xwe ya sor vekir, her du kezîyên xwe yê honayî ji balqonê hetanî ber piyên Zal berda xwarê. Jê re got:

“Hiş! Deng dernexe!

Haya qesrê pê nexe!

Elama wan jê nîn e,

Wan bi me nehisîne!

Zû bike, bilezîne,

Xwe bi kezîyan rapeliqîne!”

Destan li rex Rûdabe peya bû, bi wan çavên şîn lê nihêrî. Keça Mîhrab nizanibû ku Zal çavşîn e. Ew gav devên her du evîndaran qefilî, kêlîyekê wulo lal man, bi destê hev girtin û çun salonê. Zal di guhê wê de wuha got:

“Ev hezkirina ha, di dilê min de wê şax berde û di kûranîya ruhê min de wê reh belav bike. Hesek bêdawî ye! Ne şkence û ne jî mirin, tutişt nikare min ji te biqetîne êdî!”

Prenses sond xwar bi eşqa evîndariyek ebedî ku ew dê pê ve girêdayî be. Gava dengê muzîka ku mîna ji nava ewran, ji ezmanê kûr dihat belav bû, reqqase ji bin perdeya tûl derketin û

36

mîna mar li vî alî-wî alî bedena xwe li hev ba dan. Ew lawjena berê li ser zimanê wan bû: “Me şêrekî mêr wulo...” Her du evîndarê ku ji mêj ve ye dilê wan bûbû yek, vêcarê bedena wan jî gihîşt hev. Zal li ber xweşikîya Rûdabe direilî, ba diket qolincê wî! Heyirî mabû: “Divê îroj roj jî tarî bibe, şev bêheyv bimîne. Seba ku min îroj serê tîra xwe ya tûj li nîvê kezeba keçikekê xistiye. Min dest avêt ruhê wê yê birîndar.” Rûdabe bi gustîl û bazin, guhar û xizêmên zêr xemilandî bû. Carna pora dirêj rûyê wê wunda dikir. Zal taceke sor û aqûdî dabû serê xwe, xencerekê mîna şûr di ber xwe de çikandibû. Ji alîyekî ve şerabê vedixwar, ji alî din ve keçikê maç dikir û hilma wê dikişand pişika xwe. Hêdî diaxifî: “Heke Minûşîr bi vê yekê bihise, wê gelekî hêrs bibe. Bavê min Sam jî wê bixeyide. Lê belê ez ji her tifaq û teşqeleyan re amade me.”

Hiş û eql ji serê wan çûbû, xwestekên wan derketibû pêş. Hetanî sibehê canê wan bi hev re xwêydan da. Kela dilê xwe di hev de haş kirin û vemirandin. Gava tîrêjên rojê yên xav li pencerê xist, qewraşan ew şîyar kirin. “Ya roja pîroz! Tu îroj hinekî dereng bimanayî, qey nedibû?” Rûdabe jê têr nebibû.

Zal vegerîya bin kon, jîrik û porspîyan, remldar û kesên zana li hev civand. Dilê wî geş bû, qesr û konaxên wî xweş bûn. Wuha got:

“Gelî aliman! Bila dilê we bi rehma Xweda şa be! Em ebdê wî ne; ger em cot cot nehatibana dunê, hêz û qewet û qudreta hemî kesî dê pê re veşartî bimana, dernediket holê. Pêhlewan bêheval û bêjin nabe. Ka bifikirin; dilê mirov bi hezkirina zarokekî berşîr çiqas xweş û şeng dibe! Esl û feslê mirov bi hebûna zarokan didome. Tac û textê mirov ji wan re dimîne. Ez dixwazim ji we re eşkere bikim ku, êdî gul û nêrgiza baxçê min jî heye! Roja min li qesra Mîhrab davêje, ezmanê min

jî li ser axa welatê wî ye. Bizanibin ku dilê min prensesa Kabîlê, qîza Mîhrab heband. Bavê min ji vê yekê re bigota ‘herê’ jixwe mesele tunebû! Gelo Minûşîr dê çi bêje? Wê bêje naşît û nezan e û dev ji min berde, an wê min sûcdar bike? Gelî rûspîyan hûn ji vê yekê re çi dibêjin?”

Kesekî negot kelevist, devê wan kilît bû, bêdengî ket civatê. Seba ku Mîhrab ji malbata Dehhaq bû, kesekî bi dilekî spî û şox li vê meselê nedinihêrî. Iranîyan nevîya Dehhaq ji pêhlewanê xwe re nedixwest. Wuha gotin: “Jehrî û hunguv tevlihev dibe?” Zal hêrs bû:

“Hûn dê niha min sûcdar derînin, ez dizanim. Lê belê ez bi xwesteka dilê xwe birêve naçim. Lê divê hûn riya rast nîşanî min bidin. Dilê min ketiye dafikê, tenê hûn karin min jê azad bikin.” Bersiva wan wuha bû:

“Em hemî di bin fermana te de ne. Lê belê di vê mijarê de em şaş man. Tu Zal î, kurê Samê pîroz! Jin ne dikare te bixîne, ne jî dikare te mezin bike. Herkes zane ku, Mîhrab û malbata wî durî me ne û heta niha li dijî Iranîyan bûn. Ew Asûrî ye, ji nesla Dahhaqê xwînxwar e. A baş ew e ku nameyekê ji bavê xwe re binivîse û her tiştî jê re eşkere bike. Ew dê riyeke xêrê li ber te veke. Ku tu li biryara Minûşîr bipirsî... Minûşîr ji gotina Sam dertê?”

Zalê Zer gazî katibê xwe kir û nameyek wuha ji bavê xwe re nivîsî:

“Bavo! Ji te re hurmet dikim, destê te diramûsim. Tu jî zanî ku mirovahî bi zewacê zêde dibe. Lê min heta niha keys û fesala malavakirinê nedît. Dema tu di nava lihêv û doşeka hevrîşim de bi zewq û sefayê xenê bûbûyî, Teyra Sîmir min biribû çiyayê Elbûrzê, li wur min bi goştê ker û daşikan xwedî dikir. Bayê Elbûrzê çermê canê min dişewutand, carna jî toz û

38

duman çavê min kor dikir. Qaşo ez kurê fermandar Sam bûm! Tu li ser textê zêr û zîv bûyî, lê ez di nava rîça teyr de digevizîm. Min digot, xwelî li serê bavê min be ku bi çavê ewladekî li min nenihêrî û min avêt çolê. Ez hînî tama şîr nebûm. Mîna dîlekî sitûxwar, rûyê min miçiqî bû. Diya min jî Sîmir bû, bavê min jî!

Bavo! Niha jî belayek din hatiye serê min, ez di himêza evînê de digevizim bêçare. Evîna keça Mîhrab hêlîn di dilê min de çêkiriye; ez li ser wê digrîm. Sîtilên beravê ji rondikên çavê min tijî dibin. Ez li ser wê meşwerdekê dîn dibim; hetanî şeveqa sibehê bi heyv û stêrkan re dipeyivim. Ez bi halê xwe digrîm, xelk jî bi halê min. Digel hewqas kambaxîyan, ez heta niha ji gotina te derneketim û dernayêm jî. Ka hela ji min re bêje, ez çawa bikim. Tu destûra zewaca min didî, an na? Tê bîra te, gava te min ji hêlîna teyr deranî, te sozekî da min: Ez êdî tucar qelbê te naşkênim, tu çi bixwazî ez nabêjim na. Mirin carek e û zewac jî carek e. Li ber destê Xwedayê şev û rojan ez ad û waad dikim, ez qethen ji gotina te dernayêm.”

Suwarîyekî pê xist zengûyê, şiv li qûna hespê da, lê dengê Zal li pey wî olan da: “Ger hespê bin te bimre û tu peya bimînî jî, dîsa ji riya xwe nemîne, bimeşe û nesekine here.”

Hesp mîna ba û bagerê li hev zîzikî û serî kuta sînga suwarî. Gava suwarî gihîşt qesra Sam, nihêrî ku kesek li mal tune, xwedîyê malê li nêçîrê ye. Kêlîyekê bîhna xwe da, Sam ji nêçîrê hat, xêrhatin tê da û tavilê nameyê vekir. Rêz bi rêz xwend, lê bi her hevokê re madê wî zer bû, lêva wî qermiçî. Di ber xwe de hêdîka wuha got: "Zarokekî ku teyr ew xwedî kiribe, jixwe wê wuha be! Encax dikare tiştên beletewş bike. Min zanîbû ji vî kurî zilam dernayê! Ger ez bêjim, lawo tiştê ku tu dikî çewt e û nerê ye, wê dilê wî bişkê, wê bêje ka sozê te?

Xelkê ji min re bêje lo lo rebeno, tu çiqas ditirsî! Te ji tirsa Mîhrab ada xwe bincîh neanî. Te best û hevesa kurê xwe pûç kir. Lê belê ger ez bêjim, lawo tu li gor dilê xwe here, tirsa min ev e ku, ji vî xortê ku teyr ew mezin kiriye û ji nevîya Dehhaq cewrikê kûçikan çêbibin! Ez jî şaş mam; wuha dikim dê dimre, wuha dikim bav!"

Sam nikarîbû biryar bide. Ditirsîya, çare nedît, wî jî bang li hemî şêwurmend û falbêjan kir, civat li oda serayê gerand, bi wan şêwurî:

"Gelî heval û hogiran! Herkes zane, av û agir nayê cem hev. Zewaca her du ciwanan mîna şere Ferîdûn û Dehhaq wê bidawî bibe. Işev li stêrkan binihêrin û pênûsên xwe deynin ser niqteyek aram. Hûn îşev çi biryar bidin, sibehê werin ji min re bêjin."

Dotira rojê bi tîrêjên tavê re, yekî li derê qesrê da. Dergevan derî vekir û niwênerê remldaran hilkişîya oda bavê Zal, biryara cıvata falbêj û remldaran jê re eşkere kir:

"Ya padîşahê Nîvrojê! Ya şêrê Qela Zabilê! Mizgînê bide Zalê Zêrîn serokê egît û fêrisan û keça Mîhrab. Bêje li dunya û axretê hûn yên hev in. Me di remlê de dît ku ew dê bextewar bibin û dê kurekî wan jî wê çêbibe. Mêrxasekî wulo wê jê derê ku, bi şûre xwe dê dunyayê bihejîne. Ew dê bibe fîlekî har û hêç. Axa bin simê hespê wî wê bike zare zar!

Ew'ê textê xwe vegire li ser ewran,

Ne Tûran dihêle, ne Mazenderan,

Dijmin wê ji ber bike elaman!

Ew'ê bibe pêhlewanê axirê zeman.

Iranî dê bi şervanîya wî serbilind bibin. Mîna gulekî di dilê gelê Iran, Mazenderan û Zabilistanê de wê vebibe, di çavê Tûranîyan de wê mîna sitirîyekî qûç bibe û nema dertê! Tê pê îftîxar bikî! Şêr û piling jî wê rûyê xwe di simên hespê wî bidin. Gava bibe serpêhlewan, wê gelê me pê dilşa û bextewar bibe. Ew dê dîroka welatê me ji nuh ve binivise. Li welatên Rûm û Hindê, li Çîn û Maçînê navê wî wê bikolin li ser mohran. Teyrê Baz wê hertim li ser milê wî be!"

Sam bi van dîtin û ramanên remldaran gelekî knxweş bû. Bexşîş da niwêner, xurcika wî tijî zêr kir. Biryara xwe da: "Here, qet nesekine xwe bigihîne wî porspîyê lawê min! Bêje ev zewac ne bi dilê bavê te ye. Bêje; bavê te naxwaze qîza Mîhrab bike bûk û bîne Qela Zabilê, têxe nav malê. Lê belê ew dixwaze soz û peymana xwe bincîh bîne. Bêje ew dê ji bona te here Iranê cem Minûşîr, jê re behsa vê zewacê bike, dilê wî jî dê xweş û qanî bike."

Her du bi hev re ji qesrê derketin; li xaçerêyê ji hev qetîyan. Sam berê xwe da Iranê, niwêner jî dizgîna hespê zîvirand ser riya bajarê Zabilê.

Gava xebera xêrê ji Zal re hat, rabû gazî jinek extîyar kir û wê mîna navbeynçî şand ji dergistîya xwe Rûdabe re û nameya Sam ya erênî jî pê re. Prensesa Kabîlê ji kêfa di cîh de nesekinî, rabû û di nava civatê de reqisî û tilîlî kişand; kulmek zêr jî bi ser serê jinika extîyar ve reşand. Piştre destek cil jî bona bexşîşa wê anî jê re. Du heb gustîl jî li ser danî û berê wê da mala Zalê Zer. Lê mixabin hêja li ber derî, diya Rûdabe Sîndûxt leq

li wê jinika navbeynçî hat. Sîndûxt kêlîya ew dît, ket şikê: “Tu ji ku derê têyî? Guh bidêre û zûka bersiva min bide! Tu carna di ber min re dibezî, daw û delinga xwe li ba dixî, bêselam û kelam

xwe di hev didî û çiva didî xwe, tu li rûyê min jî nanihêrî, ev tu tir î, an kevan î, tu çi yî? Pîreboka qirêja pîs û merdal!”

Jinika reben ji tirsa lerizî, bi atiyê ket û dev û lêvên wê qufulîn. Bû lûve lûva wê, nizabîbû çi bêje. Ha ku nedît, çok da erdê û axê maç kir, sitûyê xwe li ber xanima mezin xwar kir:

-Ez pîrekek belengaz û xizan im. Bona gepek nan, çi şuxul were ber min, ez nabêjim na! Ez diçim qesr û qonaxan, kine û zêran difroşim xanim û xatûnan. Rûdabe jî tiştin ji min xwestibû; min jê re taeekî zêrîn, gustîlan û tiştên zîvîn anî.

Sîndûxt çavê xwe kuskusand, şika wê zêde bû, destê xwe xist kêlekê û pirsî:

-Madem wulo ye, de ka şanî min bide. Heke ji tûrikê te ew tişt derên, ez dê ji te bawer bikim.

Jinikê tûrik vekir, Sîndûxt baş bal û dêna xwe da eşyayên wê. Gustîlan û taeê zêrîn nas kir. Ewan gustîlan di pêçîyên qîza xwe de û ew tae jî li serê wê dîtibû berê.

-Tu derewan dikî!

Her diçû bêhtir eez dibû Sîndûxt. Boxçika wê ser û binê hev kir, hûr û mûrên wê avêt rastê. Çav bi destek eil ket; ew jî yên Rûdabe bûn. Vêearê eql ji sera çû û ên^î pora jinikê kir.

-Hey togê! Diza qereçî! Min serê bavê te di navrana te

kirê!

Bi gijika wê girt û kişand. Jinika reben ket erdê, gijik lê repisî, bû zare zara wê. Sîndûxt ew bi erdê re kaşand û bir xizînekê. Li wê derê dest û piyê wê jî girêda, ew di bin piyên xwe de eçiqand. Piştî ku têr lê xist û dilê xwe tê de rihet kir, lez kir xwe gihand qesrê, ket hundurê oda xwe û derî li ser xwe rada. Di hundur de jî hewya wê nedihat; geh diçû wî serî, geh dihat vî serî... Piştî hêrsa wê hinekî danî, bang li keça xwe kir. Rûdabe hat, dema ket oda diya xwe, histêr li ser rûyê wê dît.

42

Hêja fersenda pirsê nedît, Sîndûxt qêriya: "Tu ey heyva çarderojî! Min heta îroj çi ji te veşart ku tu ji min vedişêrî? Min çi nîşanî te neda û ji te re negot, ka bêje? Tu çima wuha şîrherem û nankor î gidî? Keçek, hetanî kengê dikare

nepenîyên xwe ji diya xwe veşêre? Ew jinika ku ji oda te derket kî bû, kî ew şandibû eem te? Wê ewan gustîl û tae û zêran ji kî re dibir? Xasma ew tae? Ka tu buhayê wê zanî? Heta me ew bi dest xist, çavê me derket! Çiqas xwîn hat rêtin bo geneînê! Lê tu nirxa wan nizanî; ji te re hatiye ji hayê, tu didî ber bayê! Xwezî min te neaniyana dunê!"

Rûdabe fedî kir, serî kuta erdê û girîya. Ji şerma, pêçîya xwe jî nelibitand. Ji çavên wê yên nêrgizî rondik dibarîyan. Bi îske îsk axifî:

-Dayîka min a şêrîn! Dilê min ketiye dafika evînîyê! Rast e, xwezî ez ji te çênebûyama, kesekî jî ne bi qeneî, ne jî bi xerabî behsa min nekirana! Dunya li serê min teng bûye dayê! Ew serdarê Zabilê dil û eegera min daye ber pêtên êgir. Êdî bêyî wî naxwazim bijîm. Ez rastîyekê ji te re bêjim; ez û wî me dil û dest da hev, bi hev re man heta sibehê. Êdî Samê pîroz jî bi vê yekê zane. Nameya wî hat; ew dê bi Şah Minûşîr re jî biaxife.

Nameya Sam, ew jinika ku te gijik lê repisand, ji min re anîbû. Wan eşyayûn di tûrikê wê de, ew gustîl û tae jî, min jê re diyarî kiribû.

Sîndûxt bi gotinên qîza xwe şaş ma. Tiştek di dilê wê de pişkuvî (mîna kêfekê an şahîyekê) û hêdî hêdî mezin bû, hat li ser rûyê wê eîhveda: Zal dê bûbûna zavê wê!

-Destan zilamekî bi nav û deng e. Bavê wî jî serpêhlewanê eîhanê ye. Jîr û leheng e, hunerên wî jî gelek in. Ez ditirsim ku Şahê Iranê li dijî zewaea we derê. Dibe ku hêrs bibe û ad^ê dagirî ser Kabîlê jî bike û welatê me ser û binê hev bike.

Minûşîr ji bapîrên me hez nake û lewma jî, naxwaze piyên me di zengûya zîn de bibîne.

Sîndûxt piştî vê axaftinê berê xwe da cîhê ku jinikê lê dîl girtiye. Berî ku ew azad bike, lê şîret kir:

-Tu mirovek jîr î. Devê te bila hevalê te be, tiştên ku tu pê zanî, ji kesekî din re nebêje.

Dotira rojê Mîhrab hat malê. Bi kêf û şewq ket hundur, lê belê gava rûyê jina xwe yê zaferanî û miçiqî dît, tûk di qirikê de zuwa bû, xwe negirt:

-Çi bûye, çi qewumî ye?

Sîndûxt:

-Ez çi ji te veşêrim, ji Xwedê nayê veşartin. Kurê Samê Nerîman kemenda xwe avêtiye dilê qîza me! Kemînek wulo çêkiriye ku, Rûdabe nikare jê bifilite. Zal dilê wê yê pak û delal bi heft girêkan bi xwe ve girêdaye. Ez pê nikarim, rûyê wê hertim zer, cegera wê bi xwîn û halê wê perişan e. Tê zanîn, dilê wê ne bi dilekî, lê bi heft dilan ketiye...

Mîhrab ji hindav de rabû piya, gotin di devê jina xwe de hişt, derhal dest avêt qevda şûr. Canê wî seranser lerizî. Rehekên çavê wî tijî xwîn bûn, got:

-Ez dê niha herim serê Zal bifirînim!

Sîndûxt ket pêşiya wî û milên xwe li nava wî pêça. Li ber geriya:

-Qurbana te me tu bisekinî, serê me nexe belayê! Di bextê te de me, tu carek tenê guh bide min, piştre dîsa weke xwe bike!

Mixabin nesekinî padîşahê Kabîlê. Ew tan da, ji xwe dûr xist û hêlan di xwe da:

-Ez kî me lêêêêê! Ez ku ji malbata Dehhaq im, xelk çawa bêyî riza min dek û dolaban li ser serê qîza min çêkin! Keç jî bêrew^t e jixwe! Xwezî ew hêja gava zarok bû, min serê wê

44

jêkiribaya! Hirme! Tu mekeve pêsîra min û astengî ji min re dernexe; ez dê di riya bav kalên xwe de bêm kuştin. Heke sibehê pêhlewanê mezin Sam û Şah Minûşîr milên xwe bidin hev û berê xwe bidin min, ew dê Kabîlê wêran bikin. Ew dê bikin ku hetanî dunya ava be, giya li ser rûyê erdê şîn nebe!

Jina wî, bona hêrsa mêrê xwe bitefîne axifî:

-Egîtê mala mino! Tu xwe çima ecz dikî? Tewer haya Sam jî ji vê yekê heye! Xema nexwe, êdî der û cînar bi me hesîyane.

Mêrê wê:

-Bese ji destê te û van virrê te! Wê bela were serê me. Ez jî dizanim ku em ji Zal çêtir zava nabînin, pêhlewanekî mîna wî nîn e. Herkes dixwaze bi Sam re mervatî deyne. Lê belê:

Duxan hîç nabe zora bablîsokê,

Ger bi ser me va neyê gurra zîpikê

Ez dê dilê xwe xweş û şa bikim

Bi zewaca vê rindikê vê xweşikê.

Dengê Sîndûxt lerzok û zîz derket:

-Mêrê mino! Sitûnê mala mino! Ka çi cotê min û te li hev asê bûye ku ez ji te re derewan bikim? Ger ev xewn rasteqîn derê û zewac çê bibe, divê tu şaş û faş nebî! Ma tu nizanî Ferîdûn jî mervatî bi padîşahê Yemenê re danîbû? Niha Zal jî vê zewacê dixwaze. Ger agir û ax, hewa û av bigihîje hev, dunya hemî dibe rûyê rojê.

Mîhrab:

-Madem wulo ye, here gazî Rûdabe bike bila were.

Jina wî bi tirs û xof:

-Na. Soz bide min ku dê fitika xwe jî pê nekî! Ger neynoka wê jî xwîn bibe, ez zanim û tu zanî ha! Bi Xwedê Kabil jî rabe piya, min û te ji hev nake!

-Ez bi meznahîya Hurmuz kim, tew destê min pê nabe!

Sîndûxt tavilê rabû û çû oda Rûdabe, jê re got “Lez bike, xwe bixemilîne, bavê te wê derheqa têkilîya te û Zal de bi te re biaxife.”

Rûdabe bi heyecana diya xwe heyirî ma:

-Çima, çi bûye, çi qewumîye dayê? Jixwe kor jî dîtine û kher jî bihîstine vê yekê. Ji bilî lawê Sam zewac li min heram be! Ez helaliya can û cesedê wî me dayê!

Gava Mîhrab qîza xwe di nava kirasê hevrîşim de, wulo bi zêr û zîvan xemilandî dît, şikre Xwedê kir, lê belê hêrsa dilê wî hêja vêketî bû:

-Piça mêjî di serê te de nîn e, tiştê ku tu dikî, ker jî nakin! Tu ji maleke xwey esl î, lê te tac û textê min da bin piyên xwe! Te hay jê heye; şerefa malbata me bû pênc pere!

Devê keçikê qufulî, kelîmellah jê çê nebû. Rûyê wê sor bû û xwîn pijiqî çavên wê. Di bêdengîyê de bijangên xwe yên reş û dirêj bi ser her du giloverîkên zeytûnî de hêdîka nisiland.

Em wan li wur bihêlin, gelo li Iranê rewş çawa bû? Gava Minûşîr eşqa Zal û Rûdabe bihîst, hilkişiya ser text û tacê da serê xwe. Dû re bang li hemî mûbît, jîrik û remldaran kir, wan li qesrê civand. Ji wan re wuha got:

-Hûn bi hal û mesela keça Mîhrab û kurê Sam zanin. Heke ev zewac çê bibe, wê dunya tarî bibe, roj wê bê girtin. Çawa ku Ferîdûn rûyê erdê ji xezeba Dehhaqê Xwînxwar xelas kir, min jî wusa Iranê ji devê gur felat kir. Niha dîsa yek ji nevîyê Dehhaq derketiye li hember me. Sedemî hevesa xortekî naşît, em nikarin dara hişkbûyî dîsa ji kok ve vejînin û bihêlin

46

ku kat bide! Heke sibê roj ji lawê Sam û qîza Mîhrab şûrekî tûj û tazî bikişe, bi Xwedê kesek ji me wê nikaribe wî şûrî bitewêne. Zarokê ku ji wan wê çê bibe, wê Şahmaran be; nîvî Şah, nîvê din mar! Gava damara mar ya jahriyê xurt bibe, ew dê Iran û Mazenderanê ser û binê hev bike. Ew dê li bin piyan herin gelek tac û text û kursî! Ka bêjin jîrikno, porspîno! Riya eql çiye?

Li ser navê gelê civatê yekî bersiv da:

-Tu mezinê me yî, ji me hemîyan jî jîrtir î. Ferman di dest te de ye. Bîhrve meke, serê dêwekî heft serî jî bi zanahîyê parçe dibe! A baş ew e, nameyekê ji Sam re bişîne.

Minûşîr bi gotina wan kir, name nivîsand û bi kurê xwe Newzer re şand ji bavê Zal re. Di nameyê de qala gelek pirsgirêkan kir û dîroka Iran û Mazenderanê anî zimên.

Ji alîyekî ve rêvebirên Iranî ketibûn tatêlê û gengaşe dikirin, ji alî din ve kulpîna dilê bavê Rûdabe bû, darê ku ji serê qîza xwe re xeritandibû, li ser jina xwe ya reben dihejand:

-Ez dê niha te û qîza te ya qahpik bi hev ve girêdim û li ber çavê xelkê bi erdê re kaş bikim. We serê min xist belayê! We zixtik di qula mozê re kir! Ez dê çawa rabim berê xwe bidim Şahê Iranê û malbata Keyanîyan? Li Kabîlê kesek heye ku li ber şûre Sam serî rake?

Jina wî çû li rex wî rûnişt. Dû re destê xwe danî ser sînga xwe û mîna jê tiştekî lava bike nerm axifî:

^şî guhê xwe bide min, piştre dîsa weke xwe bike. Dirav û gencîne hîç ne girîng in. Em di tengasîyê de ne, lê belê bizanibe ku gava şev pir tarî dibe, berbang jî pir nêzîk dibe. Ez tika dikim, tu zerarê negihîne Rûdabe. Ji bilî wê kesekî min tune.

Sîndûxt, piştî ku ji ber çoka mêrê xwe rabû, çindik da xwe, li alî gencîneyê çû. Zerzengekî padîşahan, du cot guhar, gerdenîyek zêrîn ji wur derxist. Deh hespên zînzêr anî, kinc li seyîsan kir û kemberên zîvîn da pişta wan. Sih mihînên Erebî jî ji tewlê deranî, zînên wan jî xwerû ji zîv bûn. Dû re şêst carîye xemiland, gerdenîyên zêrîn xist sitûyê wan û stekanên zêrîn jî da destê wan. Sed deve û sed jî qantir li ber derî bi rêz kir û berê xwe da Zabilê, mala Sam.

Bi tevî eşyayên xwe, Sîndûxt gihîşt bajarê Zabilê. Ji Sam re diyarîyan bir û gava li hev rûniştin, jê re tirsa dilê xwe got:

-Ya pêhlewanê cîhanê! Beg û paşa, mîr û kizîr feyz ji te digrin! Bi xêra te text û paytext li piya dimînin! Bi mohra te destê xerabiyê hatiye girêdanê.

Riya ku digihîje cem Xwedê, bi hêza gurzê te vedibe! Tu bixwazî, dikarî Mîhrab ceza bikî. Lê vêca:

Çi sûc û qebehetên gelê Kabîlê hene?

Ew ji te hez dikin, axa bin piyê te ne...

Sam pir kûr nefikirî,

Zûka axaftina wê birrî:

-Ji min re rast bêje, Mîhrab çiyê te ye,

Rûdabeya rûxweşik, qey ew qîza te ye?

Jina Mîhrab bersiv da:

-Tu qîbleya pêhlewanan î,

Lewma min diyarî ji te’r anî,

Sond bixwe, tu tiştek bi min nekî,

48

Dest pê girê nedî, serê min jî jê nekî,

Ango ez ji te pir ditirsim,

Lewma li halê te dipirsim.

Ez dikarim xezînên Kabilistanê,

Hemî bar kim, bînim Zabilistanê.

Bawerîya Sam pê hat, bi destê wê girt û guvaşt, soz dayê. Piştre bal û dêna xwe da wê, fam kir ku ew ne jinek xerabe. Xwest dilê wê têxe cîh û tirsa wê bişkîne:

-Serê min jî jê bibe, ez dîsa li ser soza xwe me. Vegere Kabîlê, tu û malbata xwe di aramiyê de bijîn, kesek destê xwe bi we nake, firîqet bin.

Bihevrebûna Zal û Rûdabe dilê min jî xweş dike. Qet nekevin xeteran. Ez dê dermanekî ji vê birînê re bibînim. Jixwe min name ji Minûşîr re jî şandiye.

Dilê Sîndûxt kete cîh, xwe ji vegerê re amade kir. Berî ku derkeve rê, bidilgermî û bawerî çend bêje ji nava lêvên bişirî pekand:

-Ger pêhlewanekî mîna te bibe mêhvanê me, gelê Kabîlê dê can û ruhê xwe li bin piya bike palas.

Çavên wê biriqîn, çimkî rûyê Sam dibişirî, lêvên wî vedibûn, mîna ku hemî kîn û buxda neyarîyê û dih^îyê ji nava wan lêvan derdiket der û wunda dibû.

Dotira rojê, Sîndûxt mizgînîyê da mêrê xwe:

-Êdî bila xerabî neyê bîra te. Ji Sam zerar nayê. Ew dê were bibe mêhvanê te!

Ji alî din ve Zal, bona dilê Şah Minûşîr xweş bike, berê xwe da paytextê. Gava gihîşt ber textê Şah, çok da erdê û axê maç kir, ji Şah re dua kir. Hetanî Minûşîr destûr neda wî serê xwe ji erdê ranekir. Kêlîkê bi şûn de, dergevanan bi milê wî girt

û ew rakirin piya, pora wî ya spî ji axê pakij kirin û dû re miskê pê de kirin. Minûşîr giregir û rêvebirên welêt li hev civand, bi hev re xwarin û vexwarin. Piştî şêniya wan xelas bû, xwîna Zal kelîya, serxweş bû û li hespê khêl suwar bû û derket çolê; hetanî sibehê çiya û newal, deşt û zozan li hev xist. Bi şeveqa sibehê re, tevî kembera xwe ya zêrîn derket qesrê cem Şah.

Roj roja îmtihana Zalê Zer bû. Remldaran reml avêtibûn, sê şev û sê rojan li stêrkan nihêrîbûn. Piştî sê rojan rahiştibûn pirtûkek bi zimanê Hindê, xistibûn bin çengê xwe û berê xwe dabûn Qesra Mezin. Dîtin û ramanên xwe ji Şah re eşkere kiribûn:

“Avek zelal wê biherike, ji zewaca kurê Sam û keça Mîhrab wê pêhlewanek jêhatî were dunê. Ew dê emirdirêj be, exlaqê wî jî wê şêrîn be. Wê bejndirêj, zîrek û qehreman be. Neyarên wî, wê bi bêhna xwêdana mûyên hespê wî bifetisin. Teyrê baz jî wê jê bitirse, wê newêribe di ser serê wî re bifire. Fêrisek wusa wê jê derê ku, kesek nikaribe milê wî deyne. Qelafetê wî, wê bibe mîna fîlekî. Şêr û piling wê têkevin dafika wî, bi kemenda wî ew dê bifetisin. Li ber heybeta şûre wî, ezman jî wê bigrî. Hetanî sax be, wê di dilê wî de hezkirina welatê Pers û Medya, Zabilistan û Mazenderanê hebe, lê belê wê nefret ji Tûranistanê bike.”

Zana û zîrek,

Mûbîd û wêrek,

Alim û rûspî,

Rêzan û dunyadîtî li hev civîyan. Gazî Zal kirin, anîn civatê, yekî ji wan pirsa yekemîn pêşkêşî wî kir:

-Duwazdeh darê min’ê selwê hene,

Pir xweşik in û terûteze ne,

Her yek sih şaxên xwe hene,

Ew şax ne kêm in ne jî zêde ne,

Ka ji apê xwe re bêje ev çi ne?

Zalê Zêrîn hema zû bersiv da:

-Sal duwazdeh meh in,

Her mehekî jî sih roj,

Sal û meh ne kêm dibin,

Ne jî ew zêde dibin.

Mamoste û zanayê welêt zanibûn Zal mêrxas û wêrek e; li çolê mezin bûbû, goştê xav xwaribû û nêçîr kiribû. Lê belê ji gel û ji jiyana civakî dûr mabû. Lewma berî bizewuce, zanîna wî diceribandin. Sûala duwemîn wuha bû:

-Du hespên min yên rehwan hene, xweş dibezin. Yek ji wan reş e, mîna qetranê ye û yê din çîl spî ye. Her du hesp li pey hev dibezin, lê belê yê dawî tucar nagihîje yê pêşî. Ev çi ne?

Zal bîstkê ponijî, dû re:

-Ew şev û roj in, got. Mîna tajîya ku berra pey seydê bide wulo li pey hev diçin, lê belê ew qet nagihîjin hev.

Ji civatê mûbîdekî porspî bona pirsa sêemîn dora axaftinê

girt:

-Sih suwarên min hene, hemî li pêşiya Şah dibezin. Gava mirov baş bala xwe dide wan, yek ji wan kêm dixuye. Lê belê dema mirov wan dijmêre, hejmara wan sih dertê. Ka hela bêje ev tên çi manê?

Zal bêsekin pê derxist:

-Sih hesp rojên heyva nuh in. Dema heyv nuh davêje, roja yekemîn bala mirov nakşîne, lewma bîstûneh roj dixuyin. Xwedê wuha çêkiriye.

Zana û mamosteyên civatê li hev nihêrîn. Zal xortekî zîrek bû, digel li çiyê mezin bûbû jî, hiş û eqlê wî li cîh bû. Pirsa çaremîn li pey hat:

-Mêrgeke min heye hêşîn e,

Diherikin çem û kanî ne,

Bi dasê hoşevê diçine Zilamekî,

Ter û hişk hemî dike yek milekî,

Ew qet ranaweste tu dikî nakî,

Te pê derxist ey Zalê serspî?

Zal hema lê vegerand:

-Ew dasvanê cotkar dem e dem! Dewr û zeman her tiştî diçine. Dem her bûyerî zû kevn dike.

Pirsa pêncemîn wuha bû:

-Du darên min yên selwê hene, di nava pêl û kefa deryayê de serî rakirine. Li ser şaxên wan çûkek hêlîn çêkiriye. Biroj li ser yekî dinive û bişev jî li ser ya din. Ji ser kîja darî difire, ew dar hişk dibe, pel û fêkî pê ve namînin û li ser kîja darî datîne jî ew dar kat dide, di pel û çîçek û fêkiyan de dixemile, ji çîqilên wê bêhna misk û emberê difûre. Ev çi ye?

-Piştî meha Avrêlê hetanî dawiya Tîrmehê şev kin dibin, lê belê Payîzê şev dirêj dibin, rûyê erdê bêtir tarî dibe. Du selwê, ev dijîtîyên xwezayê ne ku du serî jê re hene. Çûka ku di nava wan de difire û her carê li ser yekî datîne jî roj e.

Pirsa dawî di derheqa bawerîya olî de bû:

-Bajarekî min heye li ser serê çiyakî ye. Rojek ji rojan gelê bajêr biryar didin û ji jor xwe berra deştê didin, malên xwe li berriyê li nava devîyan ava dikin. Li wê der avahîyên gelekî

52

bilind ku serê wan digihîje heyvê lêdikin. Hin ji wan dibin kole û qewraş û hin ji wan jî dibin beg û axa, malxo û mîr. Demek dirêj derbas dibe, gelê wur bajarê kevn ji bîr dike. Rojek ji rojan nişkave erdhejek çêdibe. Hemî xanî û koşk û seray xera dibin û dipelişin. Piştî erdhejê, gel, li bajarê kevn poşman dibe. Ger tu bi vê pirsê jî zanibî, tu dê zewacê heq bikî.

Zal fikirî, tasek av bi ser xwe de kir û wuha cewab da:

-Ew bajarê li ser serê çiyê, axretê temsîl dike. Ew deşta bi dirî û devî, cîhê zewq û sefayê jî ev dunyaya fanî ye. Gava wext were, wê Bayê Samî rabe û wê erdhejek çêbibe. Ew çax hemî dar û devî, avahî û mal wê wêran bibin û hilweşin. Wê gavê em dê hemî li bajarê xwe yê kevn, ango li axretê poşman bibin.

Di cıvata Şah Minûşîr de, hemî zana û porspî rabûn piya û digel şah jî hemîyan Zal pîroz kir, yeko yeko rûyê wî maç kirin. "Şabaş ji te re Destan! Te niha qîza Qralê Asûrî heq kir!" Ev dengê Minûşîr, dilê hemîyan bi best û kêfê tijî kir. Meyger mey anî, pîrozbahî hetanî nîvê şevê dom kir, stran gotin û govend gerandin.

Dotira rojê, Zal kembera pêhlewanîyê li nava xwe pêça, xatir ji Şah û alîgirên wî xwest, piyê xwe xist rikêba zîn û berê xwe da cem bavê xwe.

Lo lo bira, rêya Zabilê bişewute bi dar û bî ye,

Zalê Zêrîn li hespê suwar e, xwe li ser zîn pan kiriye Şah Minûşîr qîza Qralê Asûr "herê" kiriye,

Lewma knxweş e, sermest e û dilketî ye,

Mîna teyrê basik belek bi firrê ketiye, li rê edilî ye,

Gava gihîştiye ber dîwarê Qela Zabilê ye,

Samê Pîroz ew ji dil û can bi hesretî himêz kiriye,

^tên ku li paytextê li cem Şah dîtiye û bihîstiye,

Hemî bi bêje û bêje ji bavé xwe re bi zêr û ziber kiriye, Sam gotiye "Niwînerê Kabîlê hatiye, li ode li benda te ye, Ka em ji wan re bêjin çi û bidin çi soz û bersivê ye?"

Zal got "Lo lo bavo, qurbano, ger dilê te yê şêrîn dixwaze, Rabe, hespê li pêş bajo tevî artêşê bikişe li hevraze,

Em’ê bi eşq û şewq herin, nabêjin ev çiya ye û an jî gaze, Here qesra Qral Mîhrab, wê dîlberê ji min ra bixwaze.”

Sam ferman da; dengên zengilên Hindê bilind bûn, derî û perde vebûn, êl livîya û xêbetên mala Samê Neriman amade bûn. Mirovekî li pêşî şandin bona agahdarî bide Qralê Asûrî. Bêje wa ye hat Samê Pîroz û Destanê dil bi evînê soj!

Gava niwîner gihîşt Kabîlê, Mîhrab lez kir, defên şahîyê li ser pişta deve û fîlan girêda, artêşa xwe di bin dengê def û zengil û zîlan de sef bi sef rêz kir. Bû hume huma pêhlewanan, toz û dûxan rabû ji erdê. Kêlîya serê hespê Sam di pişt qot de derket, Qral derket leq wî, ji hespa xwe peya bû û meşiya. Her du hev û din himêz kirin. Mîhrab tacekî bi zêr û zîv neqşkirî da serê Zal. Bi hev re vegeriyan bajarê Kabîlê.

Hesp dibeziyan,

Bêhna miskê ji damûskên wan difûrîya.

Li qesrê, kêfa Sîndûxt li cîh bû; tevî sê sed qewraşan ji xizmetê re amade bû. Di destê wan de sitekanên zêrîn hebûn; hemî tijî misk û ember bûn. Carîyeyên Kabîlî kulmek zêr bi ser serê Sam ve rijandin, jê re li çepikan xistin. Sam xwe guripand, sînga xwe werimand basikên xwe vekir û li pêş meşiya. Li ber şêmûka derî, devê xwe bir ber guhê Sîndûxt: “Tu dê heta kengê wê xweşikê ji me veşêrî?”

Bersiv kurt bû:

“Ger tu bixwazî rojê bibînî,

Divê tu dîyarîya wê jî bînî!”

Sam:

“Çi di dilê te de derbas dibe, metirse, bêje. Êdî di nav gencîneya min de, di tac û textê min de, di tewla hespan de û di zevî û bax û baxçên Zabilistanê de para we jî heye.”

Hilkişîyan eywana Rûdabe. Ode û eywan û şaneşîn hemî xemilandî bûn. Rûdabe bi fîstanekî melesî û biriqokî derket pêşîya Sam; çavê kurê Nerîman bi xweşikîya wê kuskusîn. Bi urf û adetên wê demê ji hev re sond xwarin û mara her dû gêncan birrîn. Piştre bûk û zava birin ser textê zêrîn, aqût û zebercet bi ser serê wan de kirin. Li serê Zal tacê zêrîn û li serê bûkê morîyên heftreng û di sitûyê wê de gerdenîya zêr hebû. Sam li ber wan sekinî û wuha got:

“Bext û taliha we vekirî ye ku rojek wuha bi eşq û şewq para we ket.”

Mîhrab jî çû deftera xelatan anî û lîsteya dîyariyan xwend. Gelek tiştên giranbuha tê de hebûn. Paşê, bi hev re derbasî odeya rûniştinê bûn. Gazî sazbenda kirin, dengê rûd û neyê kulpîn ji dilê wan bir; reqisîn, xwarin û vexwarin, hefteyekê stekanên şerabê ji dest dananîn. Bi şev û roj, kesek ji wan raneza. Roja heştemîn, Sam, Mîhrab û Sîndûxt jî bi xwe re hilanî û bi hev re hatin Sîstanê. Li wê derê jî sê şev û sê rojan dawet dom kir.

Zal û Rûdabe gihîştin miradê xwe. Sam, serpêhlewanîya Zabilistanê ji kurê xwe re hişt û tevî artışa xwe berê xwe da alî Gurksaranê.

3.

Ew dara ku kurê Sam û keça Mîhrab çandin, çend meh bi şûn de fêkî da; şîre kete gûşîyr tirî, zikê Rûdabe roj bi roj werimî û hemla wê giran bû. Neh meh û deh roj derbas bû, def lê ketin, şahîya pîrozbahîya welidandinê dest pê kir. Li Mala Zalê dawet li dar ket. Nûçe şandin çar alîyê welêt, agahdarîya Mîhrab û Sam pê xistin, gotin “Mala Zalê bêrisq û bêmirad nema, çira wan êdî natefe, Zal heta niha bêzarok bû, bêûrt û ûcax bû, lê belê êdî tuxmê Nerîmanê şehîdê çiyayê Sîpandê zîl da!” Def

lê ketin, deve hatin serjêkirin, bû şinge şinga fîncanên qahwê, tepsiyên qadehên şerabê li ser destan çûn û hatin.

Hemla Prensesa Kabîlî giran bûbû. Rojê wê xelas bûbûn, lê belê zarok nediwelidî. Kêf di gewriyan de ma, dev miçiqîn. Sancoyên welidandinê diketin nava wê, qare wara wê diçû arçê ezîm, xwîn ji navrana wê mîna ava cuhê diherikî, lê belê ha zarok were tune û ha zarok were tune! Fikar destpêkir di malê de, gelê Qela Zabilê hemî ketin xem û qirqalê. Gazî Sîndûxt kirin, ew jî hat ber serê qîza xwe, giriya û li çokên xwe xist. Tendurustîya qîza wê roj bi roj û gav bi gav xerab dibû. Pîrek û hekîmên qesrê ji rewşa wê tirsîyan, li ser serê wê civîyan, şaş

man û nizanibûn wê çi bikin. Zal jî ket tatêlê, vir de wê de baz da, hemî hekîmên welêt li hev civand da çarekî bibînin. Zikê jina wî mezin bûbû, mîna girekî goştînî repisî bû. Madê jina wî zer bûbû û devê wê çermiloqî bûbû. Çi bikin û çi nekin" Talîya talî hekîman qerar dan, gotin zarok gelekî gir e, lewma nawelide, ger em zorê bidinê wê bifetise. A baş ew e ku em zikê dê biqe^in û zarok jê derînin.

Zikê Rûdabe ji kêlek de qelaştin. Gava zarok jê deranîn weke mirov gamêşekî ji çalê derxe, kortalek wulo di nava wê de çêbû. Pitik jî xelas bû û dê jî. Bi lez û bez, nûhatiyê malê li cawekî pêçan, şînokek nezerê pê ve kirin û li ser serê wî civîyan, dua kirin. Vêcarê şahî ket dewsa fikaran, jinan li çepikan xist û tilîlî kişandin, mizgîn gihandin bavê wî, gotin zarokek te çê bû, Rûdabe ji wê ezyetê xelas bû.

Zarokek kurîn çêbûbû. Yekî çavreş, porreş û bi dest û pê bû. Qet li bavê xwe neçûbû, lê belê mû û misqal ji kalikê xwe Sam berneda bû. Bi çena xwe, bi çav û birûyên xwe û xasma bi pozê xwe. Dotira rojê, gazî pîrikek kirin bona were çavê wî kil bike. Lê belê gava cawê se rû vekirin, pîrik di

cîh de xeriqî û li erdê dirêj bû. Jinika extiyar di temenê xwe de hêja pitikek wulo çavmezin nedîtibû. Her çavekî wî bi qasî fîncana qahwê bû. Hekîman diya wî jî ji wur dûr kirin, nehiştin ew qumatka xwe bibîne. Gotin "Bila diya wî ew nebîne, ger çav pê keve, wê bitirse, heyirî bimîne, bêje vî dabetulerdî, vî cenawurî çawa ji min çê bû!"

Hetanî çil rojî nehiştin dê û zarok derkevin der û nehiştin bebik heyvê bibîne. Li gor bawerîyên demê, ger zaroka şîrmijî çav bi heyvê biketaya, wê bitirsiyana, veciniqiya û bi heyvê biketaya.

Gava pitik dan ber pêsîrê, qarîn bi diya wî ket. Zarok pêsîrê guvaştibû û bi pidiyan eçiqandibû. Rûdabe ji hêrsa got "Ev zarok ne însên e, ez nikarim ew gocî bikim. Dimre jî bila bimre!" Jîrik li hev civîyan, biryar dan, çûn gamêşekî anîn, zarok xistin bin zikê gamêşê; gava devê wî bi guhanê heywanê bû, orîn jê çû, di cîh de mexel hat. Dû re deve anîn, deve jî xwe di ber neda, Fîl anîn, dîsa wusa. Gamêş beecîn, deve beecîn û fîl beecîn, lê belê zarok gocî nebû, birçî ma. Rojek, dudo, sisê...

Mîr û pêlewan hatun serlêdanê, gotin "Ya Zalê Zêrîn, çavên we ronî bin, zêdehiyê malê bila bi dê bav mezin bibe!"

Zal rabû, li qesrê civat gerand, zana û porspî, jîrik û mûbîd li hev top kir, got "Gelî giregiran, serokeşîran û ekabîran! Em çi bikin û çi nekin?" Kesekî deng nekir, hemîyan serî pêl kir. Kesekî çare nedît. "Madem wusa ye, min tenê bihêlin!" Gava Zal tenê hiştin, wî teyra Sîmir di bîr anî. Gazî qewraşekî kir, got zû bike, bixêriyê ji min re vêxe. Lez kirin, êzing avêtin bixêriyê, kêlîya alav bilind bû, Zal hat li ber rûnişt û pirtika Teyra Sîmir ku di zarotîya xwe de, dema teyr ew di hêlînê de xwedî kiribû dabûyê ji berîka abayê xwe derxist û avêt nava terrafa êgir. Bîstkê bi şûn de, Sîmir di kulekê de xwe berra hundur da, hat li rex Zal danî û got, bêje derdê te çi ye? Destan got "Hal û mesele ev: kesek nîn e kurê min bimijîne, ji wextê ku çêbûye heta niha hêja niqutek şîr neçûye nava wî, rebeno ji birçîna

dike zare zar. Pêsîra dê peritand, gamêş û deve xwe di ber nadin. Ka em çawa bikin?”

Sîmir got: “Li alî bajarê Semsûrê jinek heye, gelekî gir e, bejndirêj e û bi hêz e. Pir bi nav û deng e, jê re dibêjin Geveşî^. Navê kurê wê Emermadîn e, ger ew lawê te nemijîne, kesek nikare bimijîne.” Li ser vê gotinê kêfa Zal hat, çû odê, li ser

textê xwe rûnişt û ferman da, tavilê du suwarî xwe amade kirin û derketin rê, berê xwe dan bajarê Semsûrê.

Ji alî din ve, nûçe dan Rûdabe jî. Gotin “Bona gocîkirina zarok, pîrikek dîtine û du suwarî çûne pey wê. Rabe, pora xwe ya dirêj şeh bike, kincên xweşik li xwe bike, êdî sebiyê te xelas bû, ew dê bijî. Çil rojên wî xelas bû, te hêja nav lê nekiriye. Ka hela bêje, em çi navî li vî sakê gamêşê bikin?”

Rûdabe got: “Mala Zalê heta niha bêzarok bûn. Çira mala Zalê zenûn bûbû, lê belê min nehişt bitefe, min RIZQ DA. Ev rizq min jî xelas kir û mala Zalê jî. Ez bi mehan li benda vî zarokî mam, lê di encamê de min rizq da. Bila navê wî RIZQ- DAM be.”

Diya wî navê kurê xwe bi mana “min rizq da” an jî “min berhem da”, RISTEM danî.

Suwarîyên Zabilî heft şev û heft rojan bi rê ve çûn, ji ser pişta hespan daneketin, roja heştemîn xwe gihandin bajarê Semsûrê û mala Geveşî^. Dergevanê ber derî nehişt ew têkevin hundur, got; “Kesek li malê nîn e, Emermadîn çûye mala şî^ (kurê mîrekî miriye) û Geveşî^ jî li mala cîranekî mêhvan e.” Nûçe gihandin Geveşî^, gotin mêhvanê we hatine ji Zabilistanê. Geveşîne nesekinî, tavilê rabû hat, lê belê gava her du suwarî çav pê ketin, di cîh de xeriqîn û li ber derî vezelîyan. Geveşî^ bi heybet bû; jinek gelekî gir û navmilpan bû. Memikên wê hingî dirêj bûn, memika

çepê avêtibû ser milê çepê û ya rastê jî avêtibû ser milê rastê. Ji dergevan re got, lez bike misînekî av bîne, bi wan de bike, bila werin xwe. Av anîn, bi ser û çavên wan de kirin, hiş hat serê wan, çavê xwe vekirin. Wan girtin hundur, li ser mînderan dan rûniştandin.

Diya Emermadîn:

-Lawo hûn çawa xort in ku ji jinekî jî ditirsin? Ziravê pisîkê bi we ve ye, an hûn ji tuxmê kewroşkr ne? Va ye ez jî weke we mirov im. Ka bêjin hela; hûn ji ku tên, diçin ku? We xêr e?

Yek ji wan bersiv da:

-Em suwariyên mala Zalê ne, ji welatê Zabilistanê tên. Xwedanê şev û rojan heta niha zarokên kurîn nedabû fermandarê me. Hemd ji Xwedê re kurek wî çêbû, lê pir gir e, mixabin diya wî nikare ew bimijîne. Lawik çil rojê xwe tijî kir, lê belê hêja gocî nebûye, birçî maye. Em bêçare ne. Zalê Zêrîn silav ji te re şand, got ger xuşka Geveşîn karibe bila were, ya na wê zarok ji birçîna bimre. Tu dil bikî, em dê te bi xwe re bibin Zabilê.

Geveşî^ deng nekir, kêlîkê hûr hûr li mêhvanan nihêrî û bersivek bi tevdîr da:

-Min nav û dengê pêhlewanê mezin Sam bihîstibû. Ez naxwazim xwesteka kurê wî Zal bişkînim.

Ew ji maleke pîroz e,

Ji welatê Nîvroj e,

Bi bîr û bawerî û soz e,

Mixabin, Emer li şî^ ye,

Ew nayê mal bi roj e.

Gava ew were mal ê,

Ez’ê jê re bikim vê qalê,

Bawer im ew min naşkîne,

Wê min bişîne mala Zalê.

Kurê min dirêj û navmilpan e,

Gir e, leheng e, goştgiran e,

Hûn ew bibînin, hûn'ê bitirsin,

Wê ji we derê hiş û ruh û can e.

60

Lawo, dema ew ji şî^ hat malê,

Qet nêzîk nebin, neçin balê,

Bila ew were odê, lê belê hûn

Rûnên li ser doşekê, li vê kenarê.

Bû êvar, Emermadîn ji şîna kurê mîr vegerîya malê û hilkişîya, çû oda xwe. Beroşa goşt danîn ser kuçik û xwarin ji mêhvanan re hazir kirin. Ewul Emermadîn li ser sifrê rûnişt bona suwarîyên Zabilî ew ji piya nebînin da jê netirsin û nexeriqin. Dû re diya wî çû cem û agahdarîya hatina mêhvanan da û meselê jê re got.

Emermadîn jî nav û dengê pêlewan Zal, Destanê çiyayê Elbûrzê bihîstibû, lewma nikaribû xwesteka wî bişkîne. Lê belê ji alî din ve jî, fikirî ku rê dûr e.

Emermadîn:

-Ji diya min bipirsin, ew bi dilê xwe ye, ger dixwaze bila bi we re were û ger nexwaze bila neyê. Qerar qerara wê ye.

Geveşî^ biryara xwe da got:

-Sam û kurê wî serpêhlewanên Iranê, fermandarên artêşa Minûşîr in. Ka ez dikarim dilê wan bihêlim? Zarokê şîrmijî jî biçûk e, guneh e, wa ye dibêjin birçî ye û li ber mirinê ye. Heyfa min lê tê. Ji berê û paşê ve ew malbatek fêris û pêhlewan in, lewma zarokên ku ji wan çêbibin jî wê bibin pêhlewanên menşûr.

Geveşîna diya Emermadîn li hespekî suwar bû û bi suwarîyên Zabilî re derket rê. Çiya û çiya, deşt û newal çûn. Malûm e jin bi wan re bû, lewma demek dirêj bi rê ve çûn, geh bêhna xwe dan, geh jî hespan rakirin telebê. Werhasil piştî deh şev û deh rojan gihiştin Zabilistanê. Gava li ber derê Qela

Zabilê ji hespan daketin, Zal bi dilekî xweş û hilperikî li leq wan hat. Li hal û wextê Geveşînr û kurê wê Emermadîn pirsî. Dû re mêhvan hilkişîya qesrê, lez kirin zarokê şîrmijî anîn. Geveşînr ew bi sivikî hilanî û li ber xwe danî, himêz kir û mijand. Rojê çar- pêne caran, Ristem têrşîrî û gocî kir. Zal bi dilekî şifqet, têr li kurê xwe nihêrî. Mîna têjika şêr bû, rûyê wî xweşik û sor bû. Mîna rojeke havîna navîn şewq dida. Lê belê sosretek giran bala bav kişand: Her du destên Ristem bi xwîn bû!

Ji alî din ve Rûdabe hêja xays bû, ji tesîra şerabê sermest bû û bi şev û roj radiza. Birîna wê dirûtibûn û derman kiribûn.

Gava Rûdabe şîyar bû û hiş hat sera, ewûl bi diya xwe re axifî. Kêfa gelê qesrê bi şiyarbûna wê hat, zêr û zîvan bi ser serê wê de kirin. Zarok anîn, dan ser destê wê. Tirsa wê şikiya, lê belê pitik mîna zarokekî du salî gir, bi zend û bend dixuya.

Li gor urf û adetên gelêrî, divêt pîrozbahîyekê bihata çêkirin. Zalê Zêrîn jîrik, pispor û mamostayan li hev eivand. Paşê qirdikek di şik^ qumatkê de ji potik û eawan da çêkirin. Nava qirdik tijî mûyên heywana siforî kirin, li ser rûyê wî şik^ stêrka gelawêjê û rojê çêkirin. Ejdiyar li ser milê wî,

peneikên şêr jî li ser destên wî xêz kirin. Rimekî xistin bin milê wî, gurzekî dan destekî û dizgîna hespê jî dan destê din. Li ser pişta hespê, çend kole jî pê re derxistin rê. Qirdik şandin ji Sam re.

Li alî din jî şox û şengî li nav hemî bax û baxçên Kabîlistan û Zabilistanê dom dikir. Li ser şerefa jidayîkbûna Ristem li her eîhî şahî hebû, dengê ney û rûdê belav dibû. Mîhrab jî nesekinî, seba vê yekê hat bû mêhvanê Zal. Wî jî li xizanên bajarê Zabilê diravan belav kir. Ji her eîhî dengê mûzîkê bilind dibû. Qirdikê ku di şik^ Ristem de hatibû çêkirin

birin, li ber Sam danîn. Gava bavê Zal çav pê ket, heyeean girt û mûyê eanê wî bûn mîna tîran, çavên wî jî sor bûn, wuha axifî: “Bi texmîna min, gava bejna nevîyê min Ristem weke nîvê meznahîya vî qirdikî bibe, kirasê wî wê bigihîje erdê û serê wî wê here ezmanan.”

Ji qesrê gurmîna dengê defan hat. Bû tepe tepa elbanan. Mîna çavê dîkekî qoqo her eîh biriqî. Bi fermana Sam li Mazenderanê jî pîrozbahî li dar ket. Piştî hefteyekê, Sam gazî katibê xwe kir û nameyeke wuha ji kurê xwe re lê kir:

“Bila baş haya we ji nevîyê min hebe, wî qene xwedî bikin. ^tên ku min anî serê te, tu neyne serê wî! Wî ji hezkirina bav mehrûm nehêlin. We hay ji qeza û belayan hebe. Ez bi şev û roj, hezar hêvî û gazindan ji Xwedayê şev û rojan dikim: xwezî temenê min têr bikira ku min xortaniya wî bidîtana. Ew gav, pişta min û te wê rast bûbûna. Êdî ne xema me bû. Niha jî dilê me rihet e, tenê mirin ji me kêm e.”

Dema ku Ristem hînî mijandinê bû, tevî Geveşîna diya Emermadîn rojê deh pîrikan ew mijandin. Êdî bi rojan re dihat, mezin dibû. Piştî ku ji şîr hat birrîn, eara pêşîn nan û goşt dan wî. Dest bi xwarinê kir. Bi qasî pêne zarokan xwarin xwar.

Ristemê Zal, gava gihîşt heşt salîya xwe, bejna wî mîna dara hewrê zirav û dirêj kişîya. Gav û saet, roj û meh, demsal û sal, dem û dewran derbas bûn; Ristem sal bi sal mezin bû. Derket kuçê, nava zarokên ji nifşa xwe, bi wan re leyîst, bi wan re gerîya. Di nava zarokên tayê wî de, yê herî gir û leheng ew bû. Dengê wî û kîja zarokî bihatana û bi kî re şer bikirana, Ristem lê dixist û ew seqet dikir. Rojek, dudo, sisê... Şeqamekî li kî bixistana, ew kes li erdê pîj dibû, kulmekî li kî bixistana dev û rûyê wî zarokî ji hev belav wela dikir. Guhê wan jê dikir, pozê wan dişkand û çavê wan diteqand.

Rojek ji rojan gelé bajêr, bavé wan zarokan li hev

civîyan, gotin wuha nabe, îtifaqa xwe çékirin û bi hev re çûn mala Zalé. Li dîwana wî rûniştin. Yekî ji wan derdê hemîyan anî zimén:

-Ya serpéhlewané cîhané! Mala Zalé malake mezin e, hûn rûmeta me Iranîyan in. Gel ji we hez dike, di şer û pevçûnan de hûn me diparézin. Lé meseleyek heye; kuré te Ristem hemî zarokén me seqet kir. Kesekî xwey tendurust di taxé de nehişt. Poz û çene, ran û mil hemî şikest. Em tika ji te dikin tu çareyeké ji vé yeké re bibîne. Zarokîn me ji tirsa wî newérin édî derkevin kuçé. Zimané me li ber te nagere, lé em jî guneh in; xwesteka me ev e ku, tu Ristem ji bajér dûr bikî, bila zarokén me jî mîna yén xelké bileyzin û bétirs bigerin.

Zal berî ku biaxife, li wan nihérî; di nav wan de extîyar û jin jî hebûn. Ji qewraşekî re got:

-Gazî Ristem bike, bila were vir.

Ristem hat civaté, Zal pirsî:

-Ristem lawo, tu çi ji van zarokan dixwazî? Derdé te û wan çi ye? Edî bi zarokén taxé re megere, hevaltiyé meke û meleyize!

-Çima bavo?Ma mafé min yé leystik û kéf û gerré nîn e?

-Lawo di kuçan de te zarok nehişt, te kesekî bitendurust nehişt. Ev çi ecéba giran e kuré min?

Ew gav, porspîyek ji civaté dora xeberdané sitend:

-Ya fermandaré me! Hûn ji maleke mezin û xuyanî ne. Tu ji me çétir zanî, lé belé bi fikra min, Ristem édî ne tayé van zarok û marûkén kuçé ye, ew édî xort e. A baş ev e ku bila biçe néçîré. Bila hewa çolé bistîne. Goştên teyr û turûdan, pezkûvî û gakûvîyan bila bixwe, dengé rawuran bila bibihîze. Sînga wî dé

qelew bibe, dilé wî jî wé mîna gîsiné xetabkirî bişide. Masûlkén milén wî jî wé bişidin.

Zal, piştî vé gotiné bi ser kuré xwe de li ba ket:

-Ev hemî cîran in, wé ji me bixeyîdin. Sedemî dijwarîya te, ew dé li ber me rabin. Şukur tu édî mezin î. Dema te ya néçîré ye. Ez dé tîr û kevan, şûr û mertalé xwe bidim te, derkeve çolé. Hewa wur paqij e. Seyd karé méran e lawo. Tu ji mala péhlewanan î, tu dé li nav bajér tor tor li çi bigerî?

Ristemé Zal, héja zarok bû bavé wî ew şand néçîré. Edî wexté wî dé li çol û çiyayan derbas bibûya. Her sibeh bi şeveqa sibehé re şîyar dibû, li hespé suwar dibû û beré xwe dida deşt û zozanan, évaré tevî néçîra xwe dizîvirî malé. Çend sal wuha buhurîn.

Rojeké ji rojan ew nehat malé; dé û bavé wî ketin tatél û qilqalé. Suwarîyan şandin çolé, li pey wî gerîyan, lé belé ew nedîtin. Rûdabe li çokén xwe xist û girîya, got rawuran kuré min xwar. Hetanî sibehé kesek ji wan raneza, hemî di nava fikar û xem û xetereyan de li benda hatina wî man. Dotira rojé, roj li dané bérîyé Ristemé gewr li derî xist. Hemî gelé Qela Zabilé li ser wî civîyan, gotin çi bû, çi nebû, çi hat seré te. Zal hat ew himéz kir û derxist oda xwe û jé pirsî:

-Ristem lawo madé te zer bûye, te çi dît, çi qewumî li te, ka béje?

Ristem piştî tasek ava cemidî, béhn berda û got:

-Bavo, min îşev sosret û ecébek giran dît ku bila neyé seré Ehrîmen jî. Doh, roj li ber ava ez rast li pezkûvîyekî hatim li quntara çiyé. Heywén revîya û bi çargahvî xwe ji min dûr kir, lé belé min bi hespé da dû. Ha li vé newalé û ha li wé newalé me bi veşartokê leyist. Ew bezîya û min jî dizgîna hespé sist kir li pey. Mîrata pezkûvîyé pir beza bû, hetanî roj çû ava û tarî ket erdé

ez li pey çûm û min di newalekî de keys lê anî û tîrekî bi newqa wê ve danî. Piştî ku min ew birîndar zeft kir, kêfa min hat û min pezkûvîyê li ber xwe suwar kir û berê xwe da malê. Lê belê êdî tarî ketibû erdê, di wê zulûmatê de çav çavan nedidît. Ez vir de çûm û wur de hatim, min rê şaş kir, şev li min geriya, riya vegera malê dernexist. Serma bû û bayekî gur dihat, pîzpîzkê lê dixist. Ez westîyam û birçî bûm. Ji hespê daketim û min çavê xwe li şikeftekê an qozîyekê gerand, xwest ku heta sibehê tê de bimînim. Ha ku min nedît, quleke tarî derket pêşiya min. Min şiveke ter ji darekê kir û pezkûvîyê gurand, hinek darikên hişk jî civand û ez ketim hundurê qulê. Min qirş û êzing dan ser hev û agir pê ve danî, goştê pezkuvîyê jî li şiva ter xist. Min bi rihetî pal da, ez li hêvîya pijîna goşt mam. Gava agir geş bû û dorhêla min ronî kir, min bala xwe dayê ku ez çi bibînim bavo! Li jora min rêza diranan....

Zal axaftina wî birrî:

-Hiş, hiş! Tu bibelqitî lawo! Xelk ecêb û sosretan ji Malbata me dibîne, tu çawa sosret ji xelkê dibînî? Way li min! Ez bêewlad mam li ser rûyê dunê. Min jî tewer wesfê te dida, digot ji tiştekî natirse, çavê xwe ji melkemot naneqîne. Ez bi hebûna te fexr dibûm, ez bi te serbilind bûbûm, lê tu

bizdonek derketî! Çawa gel bi çavekî pêhlewanan li te dinihêre, lê tu di çav xelkê de fêris î û di nava xwe de ziravkewroşk î!

Ristem xwest bidomîne:

- Di bin piyê min de jî rêza diranan diçirisî, raserî min ezmanê devê dêwekî dixuya. Ez ketibûm devê dêw. Ez tirsîyam û min tavilê xwe avêt der.

Bav dîsa ket navberê:

-Lawo tirs ji Mala Zalê re eyb û şerm e. Tu di rojeke tarî de, bi xaxekî giran herî lawo! Min jî di civat û caxîyan de digot kurê min heye!

-Bavo, tiştê ku min îşev dîtiye ger te bidîtana, ew dê dilê te bixeliyana, tu dê tetirxanî bûbûyana. Min goştê pezkûvîyê di hundur de hişt û ez dîsa birçî li çolê gerîyam. Hetanî berbang lê xist min riya malê nedît.

Zal her diçû bêtir hêrs dibû:

-Hêvîya min ji Xwedê ye ku tu bi belayek wulo herî ku kesek termê te jî nebîne lawo. Xelk ji me ditirse, tu jî ji serê mirîyekî!. Ew serê kî bû tu zanî? Ew qozîya ku te tê de agir kiriye, devê Laab bûye lawo; çend sal berê ez û wî pevçûn, min serê wî jê kir û avêt wê çolê. Guh bidêre, ez dê çîroke wî ji te re bêjim da tu fam bikî tu kurê kî û ji mala kî yî. Rojek ji rojan ez derketibûm çolê. (Lawo, mêrên ji malbata me gava hêç dibin bi çolê dikevin, sê şev û sê rojan li çiya û newalan digerin.) Di rojek min ya wulo de, ez gihîştim gelîyekî kûr û tenha. Di nava du çiyayên asê de wulo birçî gerîyam. Min dît ku wa ye seydvanek li ser serê çiyê agir vêxistiye. Malûm e, ez birçîbûm, min lezand û xwe gihand cem wî ku ez çi bibînim! Wî goştê devê li darekî ter xistiye û li ser êgir dipijîne; zimanê alava êgir mîna çiyayekî bilind dibe. Seydvanê biyanî ji min pirsî: Tu ji ku deverê yî, ji mala kî yî, ji ku der tê yî, diçî ku? Min got ez ji Zabilê me. Bona bêhna xwe

berdim, hewa paqij bistînim derketim çolê. Ez kurê Samê Nerîman im û navê min jî Zal e.

Mêrikê xerîb, piştî vê bersiva min hêrs bû, bêhnefişk bi ser wî ket û ji nişka ve qarîn jê çû: “Çûkê Xwedêyo! Niha Zal tu yî? Hey rebeno, belengazo! Tê zanîn ku tu gelekî birçî bûyî! Ez dê niha hêteke devê bidim te da zikê te têr bibe, çavê te tê de nemîne!” Hema tavilê bi zeqema sitûyê min girt û xist bin çoka

xwe. Ji alîyekî de serê min di nava meqesa ling û ranê xwe de dişidand, ji alî din de jî halan di xwe dida: “Tewlo! Pêhlewanê ku serî li ber te bitewêne, ez bimîzim devê wî!”

Laab im ez, bavê Ab û Neynokdirêj im!

Şev û roj kilamê şer û cengê dibêjim,

Bêşûr û rim, gurz û mertal gahv navêjim Di cengê de dîn û har im xwîn dirêjim!...

Remldarên me reml avêtin, gotin wê kurek ji Mala Zalê re çêbibe ku tu pêlewan nikaribin milê wî deynin. Ger tu niha sond û peyman bidî ku gava ew mezin bibe tu dê wî bişînî şerre kurên min Ab û Neynokdirêj, ez dê niha te berdim. An na, tu dê di bin çoka min de bifetisî.”

Ez bêkeys ketibûm, mecbûr mam min soz daye ez dê te bişînim cenga wan. Bona ad û wa’da xwe, min got ez dê sûret berdim. Ji wê rojê vir ve, min riyê xwe jê nekir. Gava Laab serê min ji bin çoka xwe derxist, min tavilê şûr kişand. Lawo, li wê çolê min û wî şerekî giran li dar xist. Di nav axê de, di bin toz û dûmanê de em gevizîn. Cara ewul wî keys li min anî, milê min yê çepê birîndar kir, lê ez neketim, min di ber xwe da. Gewdê Laab giran bû, lê ez sivik bûm. Derba şûre min pêşî li sînga wî ket, sîng çiriya û xwîn pijiqî. Kêliya şewişî erdê, min şûr avêt serê wî, jê kir û ew li wê çolê hişt.

Lê lawo, ma tu napirsî, nabêjî bavo te çima rî berdaye, tu di nava gevjola vê pûrtê de fetisiyî, riyê te bûye mîna hiriyê. Ada min li ber destê Xwedê, hetanî tu serê Ab û Neynokdirêj jê nekî, ez vî riyê xwe jê nakim. Lawo, gava Xwedê te da û em bi çêbûna te şa bûn, pêşî ev bûyer hat bîra min û ez li benda te mam hetanî tu mezin bibî.

68

Kurê min! Tu hêja nebûyî mêr! Tu ji devê Laab tirsiyayî. Xwelî li serê min be, qîra Helebê li rûyê min be! Çira Mala Nerîman tefiya lawo! Min jî digot qey tu mêr î! Tu ji sîp û sengeleyên nav kolanan re jêhatî yî lawo? Çavê te zarokên kuçê dibirre. Lê mixabin hêja nava hestiyê te vala ye! Divê tu hunerên pêhlewaniyê û cengê bielimî.”

Bavê wî tan li Ristem dabû. Ristem bi dilekî şikestî, lê belê bi xwe bawer axifî:

-Bavo! Qet nekeve xeteran! Wê ew roj were! Lê bes tu ji min re gurz û şûr, mertal û rim amade bike!

Zal:

-Gurzek min heye, ji kalê te yadîgar e; min gelek serî pê pelçiqandiye. Niha li gelîyekî xalî zeng girtiye.

Here ji xwe re bîne,

Sê car ji erdê bihelqîne,

Zengê jê daweşîne,

Zend û bend lê bişidîne.

Pispor û mamosteyan li hev civandin, seyisê hespan anîn, Ristem perwerde kirin, ew hînî şûr û rim, tîr û kevan kirin. Gurz hilgirt, mertal hilanî. Tîr avêt, teyran ji nav ewran anî xwarê.

Demek bi şun de, nûçe gihandin Sam, gotin nesekine, were nevîyê xwe bibîne da çi pêhlewan jê derketiye. Ristem bûye şêrekî ku di qefesa xwe hilnayê. Bûye mêrxasekî kezeppola; bi baz re difire, bi xezalê re dibeze.

Dilê Sam bi vê yekê xweş bû. Rabû, zana û alîgirê xwe li hev civand, berê xwe da Zabilistanê. Destan bihîst ku bavê wî di rê de ye, lez kir def û elbanan li ser pişta fîlan girêda û art^ş

amade kir, bo wî merasim wê çê bikirana. Nûçe ji xezûrê xwe re jî şand, Mîhrab jî hat Zabilê. Ji aliyekî de meclisa şerabr amade kir, ji alî din ve jî mertalên sor û zer xist rêzê, wan li ser hev rukuband û honand. Fîlekî bi taybetî xemiland, texterewan li ser pişta wî bincîh kir û Ristem jî li ser suwar kir. Tac û teylesan da serê wî, kembera zêrîn li piştê girêda. Mertal danî ber û tîr û kevan jî xist destê wî.

Zal, Mîhrab û rûspiyên Zabilî gava Sam ji dûr ve dîtin, çûn pêşiya wî, ji hespan piya bûn, hemî, yek bi yek bejna xwe li ber Sam tewandin û hurmetên xwe pêşkêş kirin. Serpêhlewanê cîhanê li neviyê xwe nihêrî, dilê wî bi heyecan ji cîh libitî. Hespê xwe bir nêzî wî û got “Tu her bijî şêrê malbata min!” Ristem jî wuha li kalikê xwe vegerand:

“Tu pêhlewanê dunê yî! Bingeha min tu yî! Ez ji te feyz digrim. Ez şaxekim, min ji koka te zîl daye û lewma li te çûme.” Ristem bi vê gotinê re xwe ji ser texterewanê avêt erdê. Sam jî rahişt destê nevîyê xwe û ser û çavê wî maç kir.

Hemî bi hev re vegeriyan Qela Zabilê, koşka bav û kalan. Li wê derê, li eywanan textên zêrîn vegirtin. Bi hev re henek kirin, keniyan, xwarin û vexwarin. Mîhrab jî bi hebûna neviyê xwe Ristem dipezinî. Gava ji şerabê sermest bû, wuha digot:

“Hetanî Ristem li pişta min be û hespê min Şevdiz di bin min de bibeze û şûre kalanî jî di ber min de be, kesek bi min nikare. Êdî ewr jî nikarin li ser

serê min siyê çêkin.!” Sam û Zal bi galgalên wî dikeniyan. Bi vê pîrozbahiyê mehek derbas kirin.

Serê mehê, Sam biryara vegerê da. Zal û Ristem bona ew verê bikin û bişînin, pê re meşiyan. Berî ku ji hev dûr bikevin, Sam çend şîret li kurê xwe kir:

“Kurê min! Hetanî ji destê te tê, adil be! Ji gotina Şah derneyê! Ji bîr meke, eql û raman ji zengîniyê çêtir e. Ji xerabî û

70

çavsoriyê tiştek dernayê. Ev dunya ji kesekî re ebedî namîne! Ji riya rast derneyê. Lawo, jixwe rojên min jî tijî dibin; piyekî min li hafa gorê ye, ez li vê yekê dihesênim. Piştî min, tu serokê malbata me yî û welatê Nîvrojê wê di bin fermana te de be.”

Kêliya vegeriyan qesrê, Zal ji Ristem re got:

“Lawo, tu êdî bi nav û deng î û mîna rojê jî dibiriqî! Bona heval û hogirên te bi hebûna te dilxweş bibin, hesp û zînên nexşkirî û kincên xweşik ji wan re diyarî bike da ji te hez bikin.”

Ristem bi gotina bavê xwe kir, gelek zîv û zêr, hespên khêl û Erebî li serbazên ah^ê û li hevalên xwe belav kir. Piştî ku meclisa wan belav bû, Zal derbasî harema xwe bû. Ristem jî ji tesîra şerabê bi rewşeke sermest çû nav mitêla xwe. Hêja nuh çavên wî çûbûn ser hev, bi teqe reqa derî re şiyar bû. Dengek ji ber derî dihat, digot : “Fîlê spî qeyd û zincîrên xwe qetandiye û derketiye kuçê, li vî alî û wî alî baz dide, hêç bûye, pêl zarokên xelkê dike, xortima xwe li nava qîzên xama dipêçe û derîyan dişkêne...”

Ristem ji nişka ve hilqevizî ser xwe û rahişt gurzekî û baz da, lê belê dergevanan riya wî birrîn, nehiştin derê. Jê re gotin “Em ji tirsa Şah

nikarin derê qesrê bişev vekin. Şev e, tarî ye û zulûmat e. Tewer fîlê spî jî hevsar qetandiye û ketiye kolanan. Ger em destûra te bidin û li derve tiştek bi te were, em ji destê Zal û Şahê Iranê nikarin xelas bibin.” Ristem li dergevanê pêşî nihêrî, careke din tika kir bo derî veke. Lê belê dergevan bi rik bû, nehişt. Li ser vê yekê Ristemê Zal kulmek li serê wî dergevanî xist. Dergevan ket erdê û mêjiyê wî di pozê wî re avêt. Dergevanê din reviya. Ristem hat ber derê qesrê û bi gurzê destê xwe derbek bihêz li derî da. Qufl û zincîrên derî ji hev belav-wela kir, mîna pêlên deryayê dev û pozê wî kef da û

herikî derve. Di nav bajarê Zabilê de kuçe bi kuçe geriya û Fîlê Spî dît. Ma fîl fîl bû! Mîna çiyayekî volqan, di pozê xwe re alav direşand. Rostem xwe avêt prşiya wî. Gava fîl xortima xwe dirêj kir, kurê Zal gurz li sera xist. Bedena heywên rikubî ser hev, lerizî û gindirî erdê.

Ristem vegeriya malê û serî xist xewê.

Dotira rojê, nûçe gihandin Zal, gotin hal û mesela kurê te ev. Ristem îşev Fîlê Spî kuşt. Zal xemgîn bû, bang li kurê xwe kir:

-Ne heyf! Ne heyf! Ew fîlê ku di cengê de mîna çemê Nîlê dipijiqî ji dest çû! Ristem lawo! Tu têjika şêr î, ez vê yekê dizanim! Pençe û masûlkên te bihêz in! Êdî dem dema te ye! Tê zanîn ku wexta te ya pêhlewaniyê hatiye. Êdî tu dikarî xwîna kalikê min Nerîman, ew şehîdê çiyayê Sîpendê li erdê nehêlî. Rabe, zûka xwe girêde. Çek û pûsadên xwe hilne, berê xwe bide Sîpendê. Lawo ew çiya cîhekî asê ye, qelayek li ser pozê wî heye. Burcên wê digihîjin nava ewran. Qertel nikare di ser re bifire, baz jî nikare nêzîk bibe. Firehî û dirêjahîye qelê mîna hev in; çar fersah in. Mirov di nava qelê de dijîn; av û dar, hêşînayî û mêwên tirî, zeviyên fireh û gencîne jî tê de hene. Ji bilî yek riyek, tu fersend nîn e ku mirov xwe bigihîne ber derê qelê. Ew rê jî di cîhekî asê de ye. Nerîmanê kalê min, bi fermana Qral Ferîdûn bona here mîrê wî bajarî bikuje û ew der bidestxîne, çû çiyayê

Sîpendê. Bi şev û roj li wê der ceng domand, nikarîbû têkeve hundur. Sal salewext, ew li derve û neyarên wî li hundur şer û cengê kirin. Nerîman tiştek bi dest nexist, lê belê mirovên nava qelê zinaran bi ser serê Nerîman de gêndir kirin û ew pelçiqandin. Piştî wî, vêcare kalê te Sam tevî artışa xwe çû bona heyfa Nerîman bistîne. Qumandar û fermandarên xwe li wan çol û pesaran belav kir, bi salan li wur

72

nobet girt, lê nafîle. Tu rê nedît ku hilkişe jor, têkeve hundur. Taliya talî, Sam jî bêçare ma û vegeriya malê. Lawo, tu êdî ne zarok î ku mîna berê ji serê Laab bitirsî! Rabe, sêrebend li xwe bike, xwe mîna tucarê xwê girê bide, ez dê karwanekî ji te re amade bikim. Pêdiviya wî welatî gelekî bi xwê heye. Ji salê carekî, ew ji karwanan xwê dikirin. Eba li xwe bike û pûşî bavê serê xwe bila te nas nekin. Bila çavdêrên wan te bibînin û bizanibin ku tu xwê difroşî. Ew dê ew çax rê nîşanî te bidin û derî li te vekin. Çend pêhlewanên jêhatî jî bi xwe re bibe û gurz û şûran di nava çewalên xwê de veşêre.

Ristem qenc guh da bavê xwe û paşê wuha got:

-Bavo! Ferman ya te ye! Tu bizanibe ku ez heyfê li erdê nahêlim.

Bavê wî careke din lê wekiland:

-Ji bona bapîrê xwe xwînê birjîne. Lê belê, pêşî guhê xwe baş bide min û çavê xwe jî veke. Here deştê û deh deve bikire, barê wan tijî xwê bike û ji kesekî re jî nebêje û xwe ne de nasîn.

Roja din, Ristemê Zal xwe mîna karwaneran girê da, barê deveyan tijî xwê kir, pêhlewanên bi dest û lep bi xwe re hilanî û berê xwe da çiyayê Sîpendê.

Ez’ê bi çiyayê Sîpendê diketim bêdar e, ser gurî ye,

Asê ye, bi zinar e, newal kûr e û rê bidirî ye,

Ristemê Zal karwançiye, deh barê devan xwê biriye, Notirvanê qelê, karwanê xwê ji dûr ve dîtiye,

Lez kiriye xwe bi fermandarê Sîpendê gihandiye,

Gotiye “karwanê devan hatiye li quntara çiyê sekiniye,

Min pirsiye, hûn çi difroşin, gelo barê we çi û çi ye,

Wan gotiye em ji deştê tên, barê me xwêya kevirî ye”,

Fermandar bi sê dengan li yawer bang dike;

“Here çewalan veke, binihêre û baş fam bike,

Ger ew xwê be, qet metirse, şopr bêje û rê vebike..

Yawer dîsa bang kir “Ho karwançiyo! Bêje barê te çi ye?

Tu çi difroşî bêje, ez’ê elamê bidim padîşahê xwe ye”,

Bazirgan got “ez xwê difroşim, barê min bi tenê xwê ye,

Bawer nakî, were binihêre û bibîne bi çavê serê xwe ye.”

Piştî ku yawer zîvirî qelê û ji fermandarê wur re vê yekê got û baweriya wî pê anî ku karwanê xwê hatiye, li nav gel kêf û şahî dest pê kir. Gotin “Şukur ku em îsal jî bêxwê neman” û tevî fermandarê xwe dîlanê girtin. Destûr dan, derî vebû û Ristem karwan berra hundur da. Gel li ser serê wî civîya. Pêhlewanên Ristem dest bi firotina xwê kirin, ew gav Ristem jî birin meqamê fermandar. Gava kurê Zal hilkişiya cem wî, ewul axê maç kir, dû re bejna xwe li ber wî tewand û hurmet jê re nîşan da.

Fermandar bi çavekî lêkolîner, ji serî hetanî pê lê nihêrî û wuha got:

-Tu xortekî rûpaqij î, ger dilê te jî mîna rûyê te be, tu ji gelê xwe re numûne yî. Xwê ji me re tiştekî pir pêwîst e, spas dikim.

Ristem jî wuha cewab da:

-Em xwêfû^in, karê me ev e, debara xwe û zarokên xwe bi vê bazirganîyê dikin.

Ristemê Zal vegerîya cem hevalên xwe. Zarok û zilam; xort û ciwan, kal û pîrejin lê civîyan. Hin ji wan kincên hevrîşimî, hin ji wan jî zêr û zîv ji dêvla xwê da dan Zabilîyan. Dema bû şev û tarî ket erdê, pozê qelê di nava stêrkan de wunda

74

bû, Ristem dest bi amadehîya cengê kir. Şûr û mertal, gurz û kemend hilanî û berê xwe da qesra fermandarê Sîpendê. Lê belê dergevanê ber derî rewşa wî fam kir û nehişt têkeve hundur. Lê Ristem heterî kir û pê kuta erdê; ew gav dergevan xwe avêt ser wî ku ew dîl bigre. Ristem xwe da alîyekî û xwe jê dûr kir, gurz daweşand wî. Serê dergevan bi wê derbê pelçiqî û di cîh de ket; ne da û ne sitend. Di vê hengamê de, ^kernên din jî hatin bi ser Ristem ve û li ser serê wî raweşiyan. Wê kêliyê, pêhlewanên Ristem jî derketin pêş.

Li ber derê qelê, di tarîbana şevê de li hev xistin. Li aliyekî şûr dibiriqîn, li alî din pozê riman bilind dibû. Erd ji xwînê sor bû. Ji aliyekî de qarîn û nalîn dihat. Ax û lat, kevir û zinarên Sîpendê bi xwînê hat avdan. Hetanî roj hilat û şewqa wê li bedenê biriqî, Ristemê Zal û digel hevalên xwe mîna ejderhayan şer û cengê domandin. Roj li danê taştê, wan şer rawestand. Çimkî di qelê de kesekî ku destê wî qevda şûr bigre û li hember wan rabe êdî nema. Hin hatin kuştin, hin ji wan birîndar bûn, yên mayîn jî reviyan. Dû re Ristem û alîgirên xwe li kuçe û sûkên wî bajarî qunc bi qunc geriyan û li malan yek bi yek nihêrîn, kesek ji ber şûran wan nefilitî. Di vê lêgerînê de, bala Ristem ket ser xaniyek ji kevir û derîhesinî.

Kurê Zal xwe nêzîk kir û bi gurzê xwe li derî da. Piştî ku ket hundur, nihêrî ku çi bibîne! Ji ber biriqandina zêran çav venabin! Gencîneyek wulo ku, menzel heta ber qatiyan tijî ye! Pêhlewanên Zabilî lez kirin tûr û çewalên dewsa xwê anîn û zêran dagirtin.

Di vegerê de Ristem, di nameya ku wê ji bavê xwe re bişanda, wuha got:

"Li gor fermana te ez çûm çiyayê Sîpendê. Ew ne çiya bû, quba ezmên bû! Em mîna karwanê xwê ketin hundur. Me şerekî giran li dar xist. Êdî bila dilê te rihet be, me heyf û tola

Nerîman sitend. Me pênsed hezar bar zêrê kulçe, zîv û malê gazé yê hevrîşimî bidest xist. Ez dê terş û talanên wan jî ji te re bînim."

Niwîner li pêş çû, berî karwanê Ristem vegere, xwe gihand Zabilê û name da Zal. Bavê Ristem nameyê xwend, kêfa wî hat û rûçikên wî sor bûn. Bersivek amade kir û dîsa bi wî niwînerî re şand. Wuha got:

"Kurê min, roniya çavê min! Jixwe tenê te dikaribû cengek wulo bikarana. Serkeftinî li te pîroz be! Bi wê naşîtiyê, te karê mezinan bin cîh anî û te ruhê Nerîman ronî kir. Bona terş û talanan, ez dê bi hezaran deve ji te re bişînim. Lê belê gava ev name gihîşt destê te, nesekine û were û wê qelê jî bide ber êgir, hemî bişewutîne."

Ristemê Zal li Sîpendê şûr û mohr, kumzerx û kember, kum û kolos, durr û zêr çi hene li hev civand û agir bi qelê û bajarê wur ve danî. Gava vegeriya Zabilê, bavê wî, bi pîrozbahî xêrhatin tê da; gund û bajaran bi gul û çîçekan xemiland. Dengên def û elbanan, zengilên Hindê li her cîhî bilind bûn. Ristem hat qesrê, ewul çû li ber çoka diya xwe Rûdabe rûnişt, destê wê maç kir.

Zal nûçe şand ji Samê Pîroz re; got nevîyê te heyfa bapîrê xwe hilanî, xwîna wî li erdê nehişt, çiyayê Sîpendê jî li ser serê wan kir dojeh û hemî

şewutand. Sam gava ev nûçe girt, qatek cil ji nevîyê xwe re diyarî kir û nameyek jî pê re şand, tê de wuha got:

“Divê hûn li wêrekîya şêrekî şaş nemînin! Mirov têjika şêr bibe, di nava mirovan de xwedî û perwerde bike, gava diranên têjikê derên, hemîkes dê dîsa jê bitirse. Seba çi? Çimkî ew li şîre dê nemijiyaye, lê bi her hawê xwe li bav çûye.”

Guherî sal û zeman,

Buhurî dem û dewran...

Şah Minûşîr extiyar bû, temenê wî gihîşt sedûbîstî û jiyana xwe ji dest da. Kurê wî Newzer hilkişîya ser text, di dewsa bavê xwe de taca pederçahiyê da serê xwe.

Wê demê padîşahê Tûranîyan Pêşengê kurê Zadşem bû. Hetanî wê demê gelek caran wan û Iranîyan li hev xistibûn, cengên mezin di nava wan de derketibûn. Pêşeng, mirina Minûşîr mîna valahîyekê an fersendekê dît û dîsa kum û kolosê xwe xwar kir û dest bi amadehîya cenga li dijî Iranîyan kir. Pêşeng pêşî bang li kurê xwe Efrasîyab kir:

-Kurê mino! Pêhlewan û serleşkere mala bavê mino! Fermandarên artışa me Tûr û Selm ji alî Malbata Keyaniyan ve hatin kuştin. Ev tola me divê bindoşek nemîne. Iranî, kîn û xereza Tûranîyan tucar ji dilê xwe dernaxin. Tu jî zanî ku wan gelek xerabî û neheqîyê li me kirine. Lê belê êdî Minûşîr li heyatê nîn e, roj roja tolhildanê ye lawo! Bila Tûranî histêrên çavê xwe paqij bikin.

Efrasîyab li bavê xwe wuha vegerand:

-Lo bavo! Tu hêja kurê xwe nas nakî! Ez karim bi şêran re bipevçim. Ger kalikê me Zadşem ji wan re kêm nekşandana, wê demê ders dabûna wan

û çavê wan kor bikirana, îroj jî Iranî wê ji me re bindest bimana. Lê karê kalê min ma li ser milê min. Min şûre xwe ji serê wan re tûj kiriye. Ew dê serî li ber min bitewênin!”

Efrasîyabê Bavpêşeng, ji nava gelê Tirk û Çînîyan ad^ek gelekî bihêz civand û li pêşîya wan hesp ajot, hetanî qeraxa

çemê Ceyhûnê hat. Newzerê Minûşîr ev yek bihîst, ji artâşa Efrasîyab tirsiya, zanibû ku ew li pey heyfê çavsor û dilxezeb bûye. Şahr îranê rabû, defa hewarê lê xist, pêhlewan û leşkeran di bin fermandarîya Karen de civand û berê wan da alî Dehîstanê û ew jî li pey wan çû. Konekî jê re li Dehîstanê li ser serê qelê vegirtin.

Efrasîyab ji Mala Zalê ditirsiya, lewra ji bona wan pêhlewanên xwe yên herî jêhatî Şemasas û Hazervan şandibû. Lê belê ev pêhlewan hêja di rê de bûn, nûçeyek ji wan re hat ku dilê wan pê hênik bû: Samê Pîroz çûbû ser dilovaniya xwe. Lewma jî Mala Zalê ketin şî^.

Belê, Samê Nerîman mir; Zal, li herêma Gurabe jê re goreke xweşik û tekûz çêkir û li ser mezel wesyeta wî xwend: “Lawê min! Ji neviyê Nerîman tu tenê heyî li dunê. Herwuha ji te jî tenê Ristem çêbûye. Ji malbata me, heta niha pêhlewanê herî jêhatî û çeleng, egît û mêrxas ew e. Wî heyfa bavê min Nerîman li erdê nehişt, çiyayê Sîpandê kir arî, neyarên me di bin şûr re derbas kir. Ew mêrekî wulo ye ku di ser pozê xwe re mêr naxwaze. Bila haya te jê hebe. Ger dijminên me keysê li wî bînin, bi Xwedê avê di ser re venaxwun. Hemî hebûna xwe biqurbana wî bike, bila bêtirs rabe û bijî. Ji tewlê hespekî khêl û cisne jê re bibijêre û gurzê min yê li newalê veşartî jî bidêkê.”

Mala Zalê, sedemî şîna Sam, neketin şere navbera

Newzer û Efrasîyab. Gava ew li ser mezelê bavê xwe digirîyan, cengeke dijwar li Dehîstanê li dar bû.

Li alî Keyanîyan kurên Kawa Karen û Kubad, hebûn û li alî Tûranîyan jî Barman hebû. Kubad li pêş dibezîya û li her du alîyan xweş şûr dihejand. Li kêleka wî jî kekê wî hebû. Di

kokeba şer de, Karen bang li birê xwe kir, got “Tu xwe pir dibetilînî! Xwe naparêzî, ez ditirsim ku Tirk keys li te bînin.”

Lê belê Kubad di bin tan û niça kekê xwe de nema:

“Kekê mino! Dilê min ji dila dilekî pir bi kîn e,

Tu rabe mertala bavê me Kawa ji min re bîne,

Jixwe min para xwe ji felekê sitend, Welleh ew xayîne,

Ez qert bûme, tu dibînî min por û rî jî spî kirine,

Em li ser rûyê erdê, ne ji kêfê, lê ji k^tinê re hatine,

Berxê nêr, bo kêrê ye, dawîya me hemîyan mirine,

Çawa hebe, tac û text yê mezinan e, ne para te û min e, Kesek zindî nefiriyaye ezmana cem Xwedayê Mezin e...”

Hêja gotin di devê wî de, ew gav Barman ji nişka ve li hember derket. Her du pêhlewan li hev xistin, bû şinge şinga şûran, humîn ji wan çû, hîre hîra hespan li meydana cengê dengveda. Dû re rim avêtin hev û din. Ji sibehê, hetanî roj hate qameta esrê şerekî xweş kirin. Ji esrê bi şûn de kelek û gemîyên Kubadê Kawê, wî xweşmêrî çep gerîyan. Barmanê dev bikef, rimekî avêt li kêleka wî xist, zikê wî ji alî rastê de qelişand û ew ji ser hespê de bi serserkî avêt xwarê. Xebera sar û cemidî ji Karen re çû. Karen bû gurê devbixwîn. Halan di xwe da û hêzên xwe ajot pêş. Her du ad^ş li nava hev qelibîn, ji nava dûmanê nalînên birîndaran bilind dibû. Bêhna xwînê belav bûbû û ji gurmîna dengê gurzan erd dihejiya, ji qêrîn û hêwurzê, dê weledê xwe davêt. Şûran biriqokî û rimên ser bixwîn, mîna

qertelên ku serê baskên wan li ber rojê sor dike, dixuyan. Gava zulûmata şevê mîna çermê zencîyekî reş bû, Karen artışa xwe kişand hafa Dehîstanê. Bi kuştina birayê xwe dilkeser û xemgîn bû. Gava serê xwe xist bin kon, ji Newzer van gotina bihîst:

“Qasî ku ez niha bi kuştina Kubad didşim, ez bi mirina Sam jî hewqas nedşîyam. Bila Xwedê Taala wî bi rehma xwe şa bike. Toreya rûyê erdê ev e: Mirov rojekê dikene, roja din jî digrî. Jîyan weke tavana buharê ye. Em çawa bikin? Dergûşa dunê bi tenê gor e!”

Dotira rojê, Iranî û Tûranî xwe ji cengê re amade kirin. Vê carê fermandarê artêşa Tûranî Efrasîyab û yê artêşa Iranî jî Newzer bû. Her du serok li pêşîya leşkerên xwe bûn. Dîsa dengê borîyan û defan biêşîn û şewat lê xist. Van dengan erd diterikand weke çawa ku dilên gelek dê û bavan jî diherifand... Dema her du art^şan êri^î hev û din kirin, di demek kurt de cesed civîyan li meydanê. Bêhna genî belav bû û xwîn laşan hilanî û ji wan laşan kom çêbûn. Efrasîyab, bi alahîyek suwarî pişt li Iranîyan girt, leşkeren Tirk weke xweliyê li her alî radiweşîya. Newzer tu çare nedît, biryara paşdevegere da û elama Karen jî pê xist. Hetanî tarî ket erdê, li wur di ber xwe dan, lê belê ew şev hemî pêhlewan û leşker derketin rê. Karen tevî artışa xwe gihîşt heta nêzîkî Birca Spî. Lê belê Barman li pey wî şop gerandibû û xwe zû gihandibû ber qelê. Jixwe Karen jî li pey tola birayê xwe Kubad bû, ji lewma bi Barman re pevçûn dixwest. Her du egît li ber derê Birca Spî gihîştin hev. Karenê delûdîn û çavbixwîn keys lê anî û hema rima xwe li nîvê pişta Barmanê Tûranî xist, pozê rimê di zikê wî re çar tilî avête der. Hûr û rodîyên wî belav bûn û ew ji ser hespê de ket erdê. Leşkeren wî, vê yekê bi çavên xwe dîtin, lewma ji hev peşkilîn.

Karen berê xwe da Iranê. Newzer bihîst ku ew di rê de ye, wî jî da dû. Lê belê Efrasîyab bi pey wan ket û li çoleke xalî Newzer zeft kir. Her du

fermandar li wur cane cana çûne hev, sîng di sîngê de li hev xistin, hetanî roj hat dema taştiyan dev ji

80

hev bernedan. Lê belê piranîyê, betal dikir mêraniyê; leşkeren Tûranî gelek bûn, ne serî hebû ne binî. Dor li Newzer û hezar û du sed leşkeren wî pêçan. Tevî Newzer dest û piyên hemîyan girêdan. Efrasîyab diqêrîya û li Karen dipirsî, digot "ez dê wî û Newzer bi hev ve girêdim. Bila Iranî fam bikin ez kî me?"

Ew gav nûçeyek sar di guhê wî de gotin: "Karen, heyfa birayê xwe sitendiye û Barman kuştiye, hûr û rodiyên wî ji hev belav-wela kiriye." Gava ev nûçe ji fermandarê Tirk re gotin, ew gav bavê Barman Weyse jî di huzûra wî de bû. Hema di cîh de rûnişt, li çokên xwe xist û girîya. Hetanî xwîn ji çavê wî hat nesekinî.

Ji alî din ve, qumandarê Tirk Şemasas ew gav di çemê Ceyhûnê re derbas bûbû. Ji wur, berê artışa xwe dabû Sîstanê. Hazervan jî tevî pêhlewanên xwe bajarê Hîrmendê di bin duxana simên hespê xwe de hişt. Pêhlewanê pê re, di şere şûr û xencer, gurz û kemendan de gelekî pispor bûn.

Padîşahê Kabîlê Mîhrab jî wan rojan ji mal dernediket, li ser pêvajoyê difikirî û rewşê dinirxand. Bihîst ku Efrasîyab bi hêz e û li pêş diçe, nameyekê ji Şemasas re nivîsand û şand. Tê de wuha got:

"Em ji malbata Dehhaqê Asûrî ne. heta îroj me tucarî kêfa xwe ji Şahê Iranê re neaniye. Lê ez çi bikim? Min qîza xwe da pêhlewanê wan, bi vî awayî em bûn merivên hev. Me wuha nekirana, em ji bela wan xelas nedibûn. Niha ne tenê qesr û qonaxên Kabîlê, her wuha Qela Zabilê jî di dest min de ye! Destan xemgîne, di şîna bavê xwe de ye û mezelê wî çê

dike. Ez dê qasidekî ji Efrasîyab re bişînim û dilê wî jî xweş bikim. Ger bixwaze, ez dikarim herim Tûranê û jê re xizmetê jî bikim.”

Mîhrab ji alîyekî de ji Şemasas re wuha nivîsî, ji alî din ve jî xeber şand ji zavê xwe re got “Artdşa Tirk dorhêla me zeft kiriye. Du pêhlewan di nav wan de hene ku kincên wan ji çermê piling in. Min ew xapand û bişalûsî dan sekinandin. Tu nesekine, zû were!”

Zalê Zêrîn kêliya ev nûçe ji xezûrê xwe girt, tevî pêhlewanên xwe ket rê. Xwe zûka gihand mala Mîhrab û li ber derî halan di xwe da:

“Hûn min nas nakin lo!! Ez kurê Sam im, mêrê ku li ber min rabe, ez eniya wî bi buhusta dipîvim! Li hember min, ha pêhlewanê Tirk Hazervan, ha çengek axa sar!”

Destan, kevanek zexm û hişk anî û tîreke bi qasî misasekê tê de bincîh kir, carek bi tenê li alî konên neyarên xwe nihêrî û ew tîr bi jor ve heliqand û şand. Dû re bî wî teherî sê tîrên din jî, her yek bi alîyekî de pengizand. Cîhê ku tîra pêşî lê ket, dengê girî û qare warê hat. Tirkan fam kiribû ku ew tîr ya Zal e.

Dema roja tîrêjtûj ji quba ezmên xatir xwest, ji deştê dengê gurme gurma defan û ji nava bajêr jî dengê borî û zengilan hat. Zal hêrs bûbû, kufîna wî dihat, adTş hazir kir û wan şand alî deştê, lê belê fîl û çadiran li derveyî bajêr bincîh kir.

Ewr belav bûbû, bayekî sivik ji alî bakur de dihat. Leşker ketin bêdengîyê, xelkê nefesa xwe girt, çimkî şere Zal û Hazervan wê ew roj dest pê bikirana. Wexta her du pêhlewan meşîyan navenda şer, ewul pêhlewanê Tûranî êri^î Zal kir û bi gurzê xwe li sînga wî xist, zerxê wî parçe parçe kir. Zal ji meydana cengê vekişiya û çû zerxê xwe guhert. Bêtir hêrs bû û di vegerê de gurzê Sam hilanî. Serê wî sincirî bû û kezeba wî jî xwîn girtibû.

Bi êri^a Zalê Zer re vê carê gurzê destê Hazervan pengizî û ket erdê. Bavê Ristem vê fersendê ji dest berneda,

82

tavilê gurzê Sam yê ku di şik^ serê ga de bû li nîvê enîya hazervan xist, ew di nava xwînê de gevizand û di bin piyê xwe de hişt. Şemasas vê yekê dît, lewma reviya. Leşkeren din jî çav li wî kirin û vegerîyan cem Efrasîyab.

Yên ku çûn, ji Efrasîyab re gotin Şemasas jî hat kuştin. Fermandarê Tûranî, li ser vê yekê bang li yawerê xwe kir:

“Min Newzer nekuşt, ew dîl girt, lê Iranîyan pêhlewan bi me ve nehiştin, yeko yeko hemîyan dikujin. Zûka Newzer ji zîndanê derxin, ew girêdin û ji min re bînin!” Tofek leşker rabûn û çûn zîndanê, Newzer girêdan û bi erdê re kaş kirin anîn serayê. Dû re wî îppela tazî kirin. Efrasîyab ji ser kursîyê xwe rabû û hat li wî halê padîşahê Iranê nihêrî û wuha got:

“Ez dê heyf û tola bav û kalan, pêhlewan û leşkeren xwe hemî ji te derînim. Ez dê jî dilê xwe di te de rihet bikim. Te cezayê giran heq kiriye!”

Dû re şûr kişand, sitûyê Newzer jêkir û serê wî gindirand erdê. Dor hat ser dîlên zîndanê. Hemîyan ji hundur deranî û wan şand bajarê Sarîyê û ew û alîgirên xwe jî çûn bajarê Reyê. Leşker li nav bajêr belav kir û ew jî hilkişiya ser text.

Efrasîyab li bajarê Reyê bû padîşah.

Pêhlewan û serbaz, serok û se^ş,

Bihîstin kuştina Şah Newzer bi êş,

Iranîyan rûyê xwe çirandin bi ah,

“Em man bêserok, bêmîr û bêşah!”

Kinc çirandin, axê li serê xwe kirin,

Çavbixwîn giriyan, hiş ji serê xwe birin,

Çûn cem Zal, welatê rojê Zabilîstan,

Gotin “ya serbilindê Iranê, ya pêhlewan!

Êdî bêhna xwînê ji axa me tê,

Axîn û nalîn ji nava dilê me tê.

Xwîna Ferîdûn di canê Newzer de dijiya,

Ew jî ji dunê çû, em man weke sêwîya.

Em çima sekinîne, bêtevger û bêhalan,

Serî ranakin, em şûr nakşînin ji kalan?”

Zal deng nekir serê xwe tewand,

Girîya û histêrê çavan rijand.

Rabû piya, bejn û bala xwe girêda,

Sond xwar bi egîda, bi wan şehîda:

“Ev şûr kewdan nabîne hetanî qiyametê,

Hetanî ez sax bim, wê bike vê xizmetê.

Rima min a tûj dara tolhildanê ye,

Fêkîyan wê bigre ji kînê, ji xerezê ye.

Bila li min hisret be êdî xewê van şevan,

Mirin ji ku de tê, li ser seran û ser çavan!”

Gelê bajarê Sarîyê û pêhlewanên wur, agahdar bûn ku Zal û artışa Iranîyan amadehîya cengê dikin. Ew di bin hîmaya Efrasîyab de dinalîyan û ji qetilamê pir ditirsiyan. Bona

84

Efrasîyab nerm bikin, li çareyan geriyan. Serokên gel, bihîstin ku birayekî Efrasîyab heye, navê wî Axrîres e. Rabûn nameyek jê re nivîsandin da nehêle qetl û qîtal çêbibe. Di nameyê de wuha nivîsîn:

“Tu jî zanî ku van rojan artışa Zabilîstan û Kabilîstanê xwe ji şerre kekê te re amade dike. Pêhlewan û şe^a^n Iranî bi nav û deng in, pencên wan tûj in. Heke ew dizgîna hespên xwe li alî Tûranê bizîvirînin û serê rimên xwe bidin we, Efrasîyab dê gelekî hêrs bibe û hemî hêsîran wê bikuje. Bona taca serê xwe, wê gelek serîyan jê bike. Tu birayê wî yî; jê re bêje hêsîr guneh in, bila wan azad bike.”

Axrîres mirovek zîrek bû; riyek din li ber wan xist:

“Ez nikarim bitemamî xwesteka we bincîh bînim. Divê em çareyek wusa bibînin ku kekê min jî ecz nebe. Ger Zal artışa xwe bişîne, ez dê we hemiyan teslîmî wî bikim.”

Iraniyên Sarîyê gotina Axrîres rast dîtin û qebûl kirin; bo vê yekê niwînerek ji Zalê Zer re şandin û gotin, “Axrîres êdî alî me ye, ji me re dost e. Gava hûn werin vir, ew dê artışa xwe ji vir û ji Amîlê bikşîne û biçe alî bajarê Reyê.”

Çend roj bi şûn de, Zal, li pêşîya pêhlewan û leşkeren xwe berê xwe da Amîlê. Axrîres gava ev nûçe bihîst, leşkeren xwe kişand alî Reyê. Lê belê gava Efrasîyab bi vê yekê hesiya, ji birayê xwe re wuha got:

-Şervan divê bi eqlê xwe nemeşe! Ew rûmeta xwe ji cengê digre. Fikr û raman li aliyekî û tolhildan jî li aliyê din!

Axrîres wuha bersiv da wî:

-Keko, bila piçekî rehm di dilê te de hebe. Ez dibînim ku dilê te êdî reş bûye. Ji Xwedê bitirse. Xerabiyê bi gel neke! Ev tac û teylesan gelek şah dîtiye, lê belê ji kesekî re bakî nemaye.

Ger tu qenciyê bikî, tê qenciyê bibînî û tu xerabiyê bikî jî ew dê were pêşiya te!

Efrasiyab gotin di devê birayê xwe de nîvco hişt; ji hêrsê serxweş bû û dest avêt şûr. Birayê xwe kir du parçe û di nava xwînê de hişt.

Destan bihîst ku Efrasîyab birayê xwe kuştiye, lez kir û haziriya cengê xelas kir: şûran birqî derxist, zînên Erzeromî li ser pişta hespan kir, ber û bertenga wan şidand, derzeneka pişta wan baş girêda, xurcik li pişt wan danî, gulîk û gulebendên wan bi wan ve kir.

Her du art^ş li herêma Harê gihîştin hev û din. Pêşî hêzên xwe yên pêşeng xistin cengê. Dû re suwarî li nav hev qelibîn.

Şev û rojek şer domiya,

Hin ji wan pir betilîn,

Hin jî diya wan girîya,

Birîndar ketin hin,

Yên din man ji piyan:

Xêbetên xwe civandin,

Li hespên xwe geriyan.

Nesekinîn şev û ro,

Ew di hev de bûne ko,

Nema tu xeberdan,

Westiyan dev j'hev berdan.

Piştî Newzer hat kuştin, tacê Şehînşah li erdê û textê pederşahiya Iranê vala ma. Salek wuha buhurî, dû re pêhlewanekî ji malbata Ferîdûn; Zevê kurê Tahmasb bû şahê Iranê.

Zal û Zev pênc salan bi hev re xebitîn. Di vê demê de mirovên xerab û li dijî gel ji nav art^ê hatin avêtin. Di dema nuh de qet ceng jî çê nebûn; kesek nehat kuştin û dîlên zîndana hatin berdan. Zev mirovekî extiyar û xu^êrîn bû, lewma gel jî jê hez dikir. Lê belê wan salan zad li Iranê nehat, baran nebariya, erd terikî û xelay rabû. Rûyê axê bû mîna xwê, lêvên giyayê zuwa bû. Hesreta gel bû kulmek arvan. Xelkê çapek genim bi çapek zêr dikirî.

Ev rewş ji Tûraniyan re bû fersend, lewma Pêşeng ji kurê xwe re nameyek wuha şand:

“Art^ê amade bike, ji Ceyhûnê derbasî wî alî bibe, ji tuxubê Iranê têkeve hundur. Jixwe Iranî birçîne, xelay ketiye nav wan, ew nikarin leşker xwedî bikin. Hêz û qudûm di çokên wan de nemaye, ceng bi wan nabe.”

Efrasiyab bi gotina bavê xwe kir. Ji deşta Sîpencabê hetanî çêwlîka Ceyhûnê, li her alîyî leşker belav kir. Iranî bi vê yekê hesiyan, zana û zîrekên xwe li hev civandin, agahdariya fermandaran pê xistin û rabûn lijneyek pêk anîn û berê xwe dan Qela Zabilê cem Zal. Gotin “Niha taca serpêhlewaniyê li serê te ye, rojên tengasiyê li pêşiya te hene. Ordîya Tûranê derketiye rê. Ew dê werin namûsa me, erz û eyalên me, xîreta me pere pere bikin, malên me talan bikin û rûmeta me bidin bin piyan.”

Zal ponijî,

Sitûyê wî xeliya,

Dilê wî qijqijî.

“Ji roja ku destê min qevdika şûr girtiye û heta niha, kesekî weke min pê nexistiye zengûyê hespê. Kesek ev gurz û mertalên giran jî nikare hilgire. Ez ketim gelek cengên giran, min şer kir, min xwîn rijand, lê belê ez ji extiyariyê ditirsîyam. Va ye ew roj hat. Çavê min nîşana tîr û kevanê weke berê

nabîne. Pişta min a zexm û stûr li hev rukubî û bû mîna çemberê. Tewer ez nikarim xencera Kabîlê jî hilgirim, ew jî bi min giran tê. Lê belê dilê min aram û rihet e, şukur ji Hurmuz re ji pişta min şaxeke terhînî kat da û bejn berda. Roj bi roj serê wî ber bi ewran bilind dibe. Ew êdî dikare taca meznahiyê bide serê xwe. Lê belê kemasiyek wî heye: hespên Erebî bi kêrî wî nayên, jê re hespekî şer divê. Ji Efrasiyab jî metirsin, hetanî koka Mala Zalê li dunê bijî, ew nikare Iranê bidestxîne."

Dilê Iraniyan bi gotinên Zal xweş bû, bi sozên wî anoş bûn. Zal piştî çûndina lijnê, bang li Ristem kir, ew anî odê, jê re wuha got:

"Ya pêhlewanê egît û mêrxas! Di nav vî gelî de, mirovê herî jêhatî, wêrek û leheng tu yî. Li pêşiya te gelek tengasî wê çêbibin. Divê tu ji Tûraniyan û ji Efrasîyab netirsî. Ez dizanim ku ne çaxê te yê cengê û pêhlewaniyê ye, bêhna şîr hêja ji devê te tê. Tu kêf û şeng û şerabê dixwazî, lê ez çawa bikim; hetanî kurê Pêşeng kelemê nav çavê mala Keyaniyan be, tu bi dilxweşî nikarî binivî û rûyê rihetiyê bibînî. Ez naxwazim te bişînim meydana cengê, nava şêr û pilingên hêç. Lê mixabin riyek din jî le pêşîya te nîn e. Ka tu çi dibêjî?"

Ristem, berî biaxife serî hejand, dû re giran giran:

"Bavê mino, canê mino!" got, "nav û dengê te dunê ronî dike. Tu dibêjî, tu naşît î hêja. Te şere min yê li çiyayê Sîpendê ji bîr kir? Nayê bîra te ku min heyfa bapîrê xwe sitend û çiya şewutand? Ger ez ji kurê Pêşeng bitirsim, wê çi rûmeta min bimîne? Roj roja şer e, ne ya kêf û dawetê ye bavo! Ger ez pişta gelek pêhlewanan nedim erdê, bila xwîna te li min heram be! Tu van masûlkên min yên hişk, vê bejna min ya bilind û pencên min yên fireh û mezin nabînî? Ev bona çi hatine çêkirin? Gava ez zerxê ji çermê piling li xwe dikim, ji tirsa min felek jî

dibizde. Di cengê de gava serê rima min bilind dibe, qulên taht û zinaran ji xwînê tên dagirtin. Lê belê ez hespekî jêhatî û mîna çiyayekî dixwazim, tu hesp nikare min hilbigre bavo. Divê hesp di herbê de karibe diberxwe bide û bi gotina min jî bike. Divê hînî bêhna xwînê û dengê şûr û mertalan bibe. U gurzek jî ji min re lazim e bavo. Li hember Tûraniyan gurzekî mîna zinar divê. Ez dê bi wî mêjiyên neyaran belav bikim, pişta fîlan biçirînim û mîna Nîlê xwîn biherikînim. Ev zerx jî ji min re nabe; zerxekî ji çerme bebirê dixwazim ku ne tîr û rim û ne jî av tê re here û agir jî lê neçêre. Bila şûr tê de ko bibin. Rim jî xwe di ber min nadin bavo, min rimên zexm divê; bila karibe zerxê hesinî û mertalên pola qul bike. Ez dê axa welatê Tûranê bi simên hespan bieçiqênim û pozê rima xwe di heyvê de biçikînim!"

Zal:

"Berxê bavê mino! Tê zanîn tu ji dengê rûd û neyê kerixî yî û ji bêhna meyê jî têr bûyî. Ez dê gurzê kalê te Sam ku wa ye li newalê veşartîye, ji te re derînim. Yadîgar e, temînîya min li te be lawo, ew bila nekeve destê neyaran."

Gava Ristemê Zalê, serbilindê Iranîyan rahişt gurzê kalê xwe yê kevnare hejand, sê caran bi destê çepê bilind kir, bi yê rastê girt û li tahtê xist, zengara sed salan ku pê ve bû jê weşiya. Ji destê wî re sivik bû, rabû not heb bijkojên ji pola jî pê ve zêde kir, mîna deh destarê êş giran kir.

Bavê wî lê nihêrî, ew eciband, got "gurzê xwe deyne mal û here nava keriyê revokê hespan ku wa ye li çolê. Ji nav wan, hespekî baş, bi dilê xwe bibijêre. Ger tu di nav wan de li gor xwe hespek nebînî, biçe nava tewlên Kabilîstanê." Ristem pêşî di nav hespên Zabilê de geriya, qenc bala xwe da wan, li ser hemiyan mohra padîşah hebû. Yek bi yek destê xwe danî ser pişta wan, lê belê destê xwe li pişta kîjanî dixist, ji hêz û

giraniya destê wî pişta hespê ditewiya û zik digihîşt erdê. Hîrîn ji wan diçû diketin xwarê. Di nava tewlên Zabilê de û di nava revokên Iranê de tu hesp nedît li gor xwe. Bajar bi bajar, çol û pesar geriya, lê mixabin caniyek jêhatî nedît. Vêcarê berê xwe da Kabîlistanê, welatê kalê xwe Mîhrab. Li wê der jî padîşah û gel jê hez dikir; colên hespan anîn, di ber wî re buhurandin, Ristem li wan nihêrî, hemî rengîn bûn û xweş dibezîyan. Canîyek k^ekreş û piştsor ji nişka ve ji nav kerî qetiya, xwe cihê kir û ber bi kurê Zal ve hat; serî rakir û li ber wî rawesta.

KGekreşî bû,

Ling teşî bû,

Guhkewroşk,

Damûsk kurîşk,

Sitû dirêjî Û navtajî bû,

Dûv rêsî,

Pişt balgî bû.

Sînga wî sînga şêr,

Caniyek zexm û nêr Newqa wî gelek kurt,

Ranên wî tije û xurt.

Serbilind bû û ziravnavî,

Beziya hat biçargahvî,

Damûsk dirêj û xelek,

Navê wî Rexşê Belek.

Dest danî ser pişta wî, lê belê canîyê teze xwe qup kir û bicuret di cîh de nelibitî. Kurê Zal li nava wî ya zirav nihêrî û li wêrekiya wî. Got “Canîya

terûteze, hêja ti xişîm û lawaz î, şîre di devê te de hene. Tu dê çawa tevî gurzê Sam ku mîna risasê ye, min hilbigrî?” Canî hîrîya û rabû ser her du lingên pêşî. Eşkere bû ku, ew mîna fîlekî bihêz û mîna şêrên çiyayê Bêsitûn jî jêhatî bû. Gava hîrîya, dengê wî ji Kabîlê çû Zabilê.

Seyisê Kabîlî bîstkê bi şûn de hat cem Ristem. Ristem jê

pirsî:

-Ev caniya nuhgehîştî ya kî ye? Çima her du newqên wî bêmohr in?

Seyîs:

-Tu çima li mohrê digerî? Mohra padîşah li ser rahnên canîyên wuha nîn e. Derheqa vî hespî de gelek rîvayet hene, herkes tiştekî dibêje. Me navê wî REXŞ daniye û sedemî ku belek e jî, em jê re dibêjin REXŞE BELEK. Ev sê sal in ku me zîn daniye ser pişta wî. Bala gelek suwarî û pêhlewanan dikişîne. Gava diya wî te bibîne, ew dê ên^ bike û te gez bike. Divê tu li cem diya wî kemendê navêjî wî. Sir û nepenî di vî caniyî de hene, lê belê em nizanin. Gelek hunerên wî jî hene; bifam e û suwarîyê ser pişta xwe qethen li çolê birîndar nahêle. Di cengê de jî hîç natirse:

Ji şingîna şûran,

Ji halanên mêran,

Ji orîna şêran

Û ji derbê rim û kêran.

Rev qet ne karê wî ye,

Serketin para wî ye.

Ristem kemendê avêt sitûyê caniyê. Diya caniyê ew dît û rabû telebê, zûka xwe gihand cem Rexş û xwest ku bi diranên xwe kemendê biqetîne. Lê belê Ristem qêrînek wulo lê kir ku, deşt û zozan hejiyan. Bi qêrîna wî hespa navsere di cîh de sekinî. Dû re Ristem kulmekî li serê Rexş xist û ew

di cîh de mexel kir. Kêlîkê bi şûn de canî ji erdê rabû û bi sermestî bazda nav col. Lê belê Ristem li pey çû û vecarê girênîvka kemendê gelekî teng kir û avêt û ew careke din zeft kir û lê suwar bû. Rexş serî jê re tewand û ket bin bandora wî.

Ristem bang li seyîs kir:

-Ho seyîso! Ka bêje lo; bedêla vî ejderhayê cirnexweş çiqase lo?

Seyîs:

-Heke serbilindê Iranîyan Ristemê Zalê, xwediyê gurzê ji mifriq û pola, egîdê şerê çiyayê Sîpendê tu bî, kesek ji te zêr û dirav naxwaze. Hema lê suwar bibe û biçe. Tu bi kar û emelê welêt re ewle dibî. Bedêla vî hespî, welatê Iranê ye!

Diranên Ristem mîna mircanan xuya kir û lêvên wî bişirîn. Zînek ji zînê Entabî danî ser pişta Rexş û li devê wî nihêrî.

Rexşê Belek, Ristem bi hêsanî hilgirt û berê xwe da malê. Kurê Zal li rê, rast li extiyarekî hat, tûrek li pişta wî bû. Çû li ber wî sekinî û ji sofî pirsî:

-Wusa dixuye ku tu westiyayî. Tu dixwazî ez te li hespê suwar bikim, hetanî cîhê ku tu diçî te bibim?

Kalo:

-Na berxê min, tu li riya xwe here, oxira te a xêrê be!

Ristem:

-Kalo tu çi karî dikî, diçî ku derê?

92

-Ez nalbant im. Li gundan digerim.

-Tu dikarî bin piyê hespê min jî nal bikî?

-Ser sera û ser çavan lawo.

Extiyarê gerok gava ji çewal hacetên xwe deranî, bala Ristemê Zal tiştek kişand: nal û bizmarên kalo ji cam bûn. Bi destekî sivik her çar piyê hespê nal kir û got “Oxir be ji te re!” Lê belê Ristem xwe negirt:

-Kalo, te van caman bi bizmarên cam li bin piyê caniyê reben xist;

Ev çi nal e,

Ev çi hal û hewal e,

Ez dê çawa bi van caman bigihîjim mal e?

Çar gahv wê de, wê li kuç bikeve bibe pare pare.

Sofiyê extiyar:

-Tu lê nepirse berxê min! Li riya xwe here. Bila oxira te vekirî be. Şikestina van nalan, mirina hespê te û mirina te wê bi hev re be.

-Tu çima nabêjî mirina min nêzîk e. Ruhê min hatiye

çokê!

Sofî:

-Na lawo na. Frîqet be! Tu mirovekî xwey siûdî. Li cem Xwedê pêşiya te hatiye vekirin. Serê te wê têkeve gelek qal û balê giran, lê belê tu dê biserkevî. Temenê te jî wê dirêj be.

Ristemê Zal bi Rexşê Belek xwe gihand malê, xulam û xizmetkar lê civiyan, êm danê, ew şûştin û pirça wî şeh kirin. Bona nezerî nebe, her şev bi giyayê reşreşkê ew kizirandin. Hespê khêl û cisne, li çol û meydanan bezandin, çena wî nerm

bû, beziya hetanî devê wî kufik girt, ling û ranên wî tekûz û zexm bûn. Newqa wî gilover bû, şipil û şiyar bû.

Rexş baş hînî xwediyê xwe bû, gava xwedî lê suwar bû hîrîn jê çû û serê xwe kuta sînga wî, dûva xwe rep kir.

5

Wê demê, li welatê Tûranê bi navê Mînas pêhlewanekî bi nav û deng hebû. Tûraniyan wuha peznê wî didan:

Pêhlewanê serdar Mînas e,

Çepildirêj e, egît û mêrxas e,

Gir e, giran e weke risas e,

Çav mezin e mîna tas e,

Neynokên wî mîna das e,

Pêçîyên wî wek misas e,

Sed û pêncî mîtro caw,

Jê re nabe derpê û kiras e.

Hespekî wî hebû, bêhawe û hêç bû, seyîs xwe di ber nedida. Ji her bajarî seyîs û perwerdekar anîn, lê bêfeyde! Canîyê xişîm û serhişk, du roj bi şûn de zîtikek li ser dilê seyîse nuh dixist û ew di cîh de dikuşt. Mînas welatê Tûranê ser û binê hev kir, kesekî nedît ku ji heqê hespê wî derê û ew hînî suwariyê bike. Jîrik û pisporan li hev civand, lijneya şêwurmenda vexwendî qesrê kir, ji wan pirsî : “Em çi bikin, çi nekin?” Yek ji wan got:

“Me bihîst li welatê Zabilistanê kurekî Mala Zalê heye ku digel hêja zarok e jî, mêrxas e û bi dest û pê ye. Dibêjin ji niha ve diçe meydana cengê. Xortekî jêhatî ye. Bi tenê ew dikare hespê te bihewisîne û kedî bike.”

Ev pêşniyazî ket serê Mînas, qebûl kir û got “Rabin, ne roja seknê ye!”

Pêlewanê bi nav û deng qumandarê Tûranî Mînas, ferman deranî, li çarhawîrdorê welêt bang li hemî şervan û serdaran kir. Mêrên ku destê wan qevdika şûr digirt, li hev civand û got: “Em dê herin, dagir bikin ser welatê Zabilistanê, Qela Zabilê têxin bin hîmaya xwe û singên konê xwe li wur biçikînin, bi şer be, bi pevçûn be, an jî bi xweşkayî û xwestekî be, em dê kurê Zal bi xwe re bînin û bikin seyisê hespê. Heke bi dilê xwe neyê, em dê dest û piyên wî li qeydê bixînin û wî li ser pişta fîl girêdin û bişidînin”

Mînas rabû, xêbetên xwe bi xwe re hilanî, da pêşiya art^ê û tevî pêhlewan û leşkeran berê xwe da Zabilistanê. Heft şev û heft rojan nesekinîn, roja heştan li ser riya xwe bêhn berdan, li mêrgekî hesp tewulandin, li xanekî rawestiyan û razan. Navê qralê wî welatî Zemirxan bû. Qral hat, bixêrhatin di wan da, bi wan re sohbet kir, pirsî “Ev çi hewalê we ye, hûn diçin ku?” Mînas got, hal û mesela min û caniya xişîm ev; em dê herin kurê Zalê bigrin, bi xwe re bibin Tûranê.”

Zemirxan jî alîkarî bi Mînas re kir; tîr û kevan, rim û mertal, şûr û xencer da wan. Taximek leşker jî bi wan re şand.

Dotira rojê, bi pozê şeveqê re dor li Qela Zabilê girtin, li çar aliyên Bajêr konên xwe vegirtin. Mînas, niwînerek şand Mala Zalê. Niwîner baz da, çû li derê qelê xist, li Ristem pirsî. Dergevan got “Ew ne li male, çûye nêçîrê.”

Bû êvar, gava Ristem tevî nêçîra xwe ji çolê vegeriya malê, nihêrî ku rûyên hemî kesên nav malê qermiçiye û daleqiyaye, bi şûr jî devê kesekî venabe, madê herkesî zer e, diponijin bi ser halê xwe de. Fikar jê re çêbûn, bang li Rûdabe kir:

-Dayê, dayê! Ev çi hal e, çima şîn ketiye malê? Çi bûye, çi ciriyaye ku hûn ji min vedişêrin? Ez bi Xwedayê şev û rojan kim û bi nanê Qela Zabilê kim, Zalê Zer neheqiyek bi we kiribe, an çêr bi we kiribe, an jî li yekî ji we

xistibe, ez dê bi zeqema wî bigrim û li binê guhê Qela Zabilê bixînim ku hetanî qela avabe, çermê wî bi kevirê dîwarê qelê ve bimîne!

Rûdabe got:

-Na lawo! Xwedê neke! Bavê te ne çêr bi me kiriye û ne jî li kesekî daye. Lê belê:

Min digot qey tu kurekî şîyar û jîr î,

Tu hîç li dora xwe nenihêrî û nabînî,

Tu bala xwe nadî li çadirên dora bajêr,

Li wan mertalên fireh, li wan şûran khêr,

Dengê hêwurza Tûraniyan nayê te?

Mînas al çikandiye, çav berdaye te,

Ew'ê destê te girêde, pê li qeydê bixe,

Bibe Tûranê, bike seyisê hespê xwe.

Lawo, ew bi ronahiya berbangê re hatine,

Singên konan çikandine, dora bajêr girtine,

Çil pêhlewan li ser serê Mînas civandî ne,

Bîst li vî alî gurz lê dixin û bîst li alî din e,

Bi gurzê mifriq li serê wî dixin,

Çavên wî venabin ew dikin nakin;

Ew ji xewê şîyar nabe,

Sermestî ji ser wî ranabe,

Damarên çavê wî weke kêranan,

Bang dike û di xwe dide halanan:

“Ez Mînas im, egît û gernas im,

Bi rim û şûr, bi gurz, tîr û das im.

Hey ûcaxî korno, taqet di we de nemaye!

Bi hêz lêxin, bila ronî têkev van çava ye.”

Ristem got:

-Dayika mina şêrîn! Tu qet xwe neêşîne! Tu hukmê kurê xwe zanî! Ger ku mêr be, bila were min bi darê zorê bibe û bike seyisê hespê xwe. Ji wî û bavê wî zêde ye! Jê tê bila texsîr neke! Lê belê tu jî dizanî ku, ew dê paşika sitûyê xwe buxrîne!

Dotira rojê, Ristem kincên xwe guhert, xwe bi şiklek din girêda bo ku neyê nasîn û tenê çû bin çadira Mînas. Li ber derê kon, şingîna gurzan bihîst; nihêrî ku çil pêhlewan li ser serê Mînas civiyane û bona xewa wî birevînin, çavên wî vekin lê dixin. Lê belê dikin nakin xwîna damarên çavê wî belav nabe. Ji alîyekî de jî Mînas diqîre: “Hey belqitîno! Ûcaxî korno û derî

momo! Malmîratno ev çi bûye ji we? Zikê we birçîye, an hûn nexweş ketine? Çima hêz di milên we de nemaye? Bi vî halî, hûn dê çawa bi Mala Zalê re têkevin cengê? Xwelî li serê we bûyo! Hûn şîrşiitî mezin bûne? Haydê, bizerb û biqewet li serê min bixin, bila kêranên çavê min vebin! Rehekên çavê min ewçend werimîne ku, xwîn xwe berra mêjiyê min dide!”

Ristem bêdeng xwe nêzîk kir, bêhis û çip çû li rex wan sekinî. Kesekî ji wan ew nas nekir. Di guhê Mînas de bidizîka wuha got:

-Ger tu destûr bidî, ez dê bi singê konê te yek derbeyek li serê te bixim. Tu dê bibînî, çavên te jî wê vebibin û êşa serê te jî wê rihet bibe.

Mînas li Ristem nihêrî, şaş ma, ew nas nekir. Pirsî:

-Xorto, tu ji ku derê yî?

-Ez ji Zabilê me.

-Bila be. Lê belê heke tu soza xwe neynî cîh, ez dê serê te hilqetênim û bavêjim newalê. Tu vê yekê jî zanibî ha!

Ristem ji xwe bawer:

-Min qebûl e.

Kurê Zal, suwarê Rexşê Belek ji ber kon singekî rakir û hat bin çadirê, pêhlewanê Tûranî xwe ji ber dan alî û bi çavekî beloqî û bi nêrînek şik li vî xortê dirêj û navmilpan nihêrîn. Ristem, hema hetanî qewet tê de hebû, derbeke bi pihêt li serê Mînas da û ew di cîh de bêhiş xist. Pêhlewanên bin kon ji şerma şemirîn û serî pêl kirin û deng nekirin. Ristem sing bi ser wan de avêt, ji bin kon derket, dest û milê xwe hejand û berê xwe da malê.

Qumandarê Tûranî çend saet bi şûn de hat xwe, li dorhêla xwe nihêrî, xortê Zabilî li bin kon nedît. Bang li dergevan û xizmetkaran kir: “Herin gazî wî bikin, bila were da ez hîn bibim

ew kî ye, ji mala kî ye û çi kes e. Ew derb ne ya dostaniyê, lê ya neyariyê bû! Ew kî be, xereza min di dilê wî de heye!”

Kêlîkê piştre Ristem hat bin çadirê û xwe bi Mînas da nas

kirin:

-Ez nevîyê Samê Nerîman, kurê Zalê Zêrîn Ristem im. Ew kesê ku tu bona wî hatî vir, kesê ku dixwazî ew bikî seyisê hespê xwe, ez im.

Mînas li xortê simbêlqeytan nihêrî û bi zarekî fedîkar: -Xwarzê, te ji min re çewt dabûn nasîn, gotibûn ew hêja zarok e. Lê belê niha...

Ristem gotina wî birrî:

-Lê niha tu dixwazî em şerekî li dar xin?

Biryar dan. Dotira rojê, li meydana herbê ew dê sihêtiya hev û din bikirana.

Sibehê zû, Ristemê Zal serlehengê Iranîyan ji nav nivîna xwe rabû.

Gîzma fenerî kişand ling,

Li xwe kir zerxê ji çermê piling,

Zirîç û kumzirîçê xwe, zerx û kumzerxê xwe hilanî,

Xavê kemendê jî deranî bi kêleka zîn ve danî.

Gava li Rexşê Belek suwar bû, weke ku çiyayekî hilkişe ser çiyayekî din, wula bi heybet li meydanê rawesta. Dema xencera Xerzanî xist ber xwe, mîna ku minara Heskîfê têxe ber xwe. Wadê mertala ji mifriq û pola hilanî, weke ku deşta Mêrdînê hilkişe ser çiyayê Sîpanê! Dû re rahişt gurzê Samê Pîroz yê ku ji newalê anîbû û not movik bi ser ve zêde kiribû. Sê caran, gurz bi destê çepê teqiland û bilind kir, bi destê rastê girt. Xwe bi lez gihand meydana pêhlewanan.

Mînas jî xwe ji cengê re amade kiribû, kincên cengê li xwe kiribû, hacetên xwe derxistibû. Her du pêhlewan li ser pişta

hespan derketin meydanê. Pdşî bi gurzan çûn hev û din. Ji gurmina wan risasan erd dihejiya, çirûsk ji ber destê wan dipekiya. Kêliyekê wulo hev û din ceribandin, dû re şûr kişandin. Gava şingîn ji şûran çû, birûsk li erdê ket. Wîze wîza tîrên birûskê, dengê cewrikê kûçikan derdixist. Minas kêliyekê xwe da kêlek li piya rawesta, halan di xwe da:

“Wah! Ez kîme lo? Navê min Mînas e,

Neynokê min tûj in mîna das in,

Pêçîyên min wek misas in,

Gir im, giran im wek risas,

Ez li tu pêhlewanî nabim qiyas!”

Gel li dorhêla meydanê civiyabû. Bal û dêna Zabilîyan li ser kurê Zal bû, Ristem jî vê yekê dizanîbû û lewma bêbersiv nema; bi sewtek tûj qêriya:

“Ji min ra dibêjin Ristemê Zal,

Neviyê Samê Pîroz, kurê Destanê kal!

Hespê bin min Rexşê Belek e,

Ez bi neyaran vedidim ji kêlek e!

Gurzê destê min giran e weke risas e,

Ez jî bi yekî mîna te re nabim qiyas e!”

Çavê Ristem tijî xwîn bû û ji hêrsa destên wî lerizîn, hema kemend ji kêleka zîn vekir û avêt. Ew gav Mînas jî kemenda xwe derxist, her du pêhlewan li dora hev çûn û hatin, li keysekê geriyan. Gava kemendan diavêtin hev, ji nava konan

100

toz û dûman bilind dibû. Ji bayê wan bablîsok rabû, singên çadiran ji cîh rakir. Ezman guherî rengê zaferanê. Carek din şûr û mertal deranîn. Dengê mertalan temaşevanan kher kir. Hin kesan got “Dema Sefyan e, Sefyan rabûye!” Çend kes gotin “Deccal e, Deccal hatiye ser rûyê erdê.” Melayket ji şer û cenga egît û fêrisan bizdiyan, ji ezmanê yekemîn, firiyan ezmanê heftan! Ecacok ket rûyê deryayê; hût û rawurên avê ji nav pêlan pengizîn der û têjikên xwe di avê de sêwî hiştin. Teyrên Baz ji hêlînan firiyan, nikulên xwe xistin xwînê! Gava tava navrojê rûyê axê qijiland, bêhna xwîn û xwêdanê pozê temaşevanan xitimand. Mar û dûvpişkan, xwe di kûraniya qulên xwe de veşartin û serî dernexistin der. Jûjîyan jî di wê qêreqija navrojê de gewdê xwe di nava çermê xwe yê bi sitirî de nuxumandin.

Her du pêhlewan, li ser pişta hespan keys li hev neanîn û fam kirin ku wuha zora hev û din nabin. Vêca daketin erdê û bi hirê beranan êri^î hev kirin. Gava Mînas bi Ristem girt û ew heliqand, piyên wî mîna aşaşokê li hewa geriyan, lê belê dema Ristem bi wî girt û teql lê xist, pêhlewanê Tûranî bi gewdê xwe yê mîna zirîçê ji cîh nelibitî. Cara duemîn cardin weke hogiçan hirrî hev bûn. Di vê pêşrevê de Ristemê Zal hemî hêrs û hêza xwe civand û teql da Mînas, ew pengizand, zîzikand û li erdê xist. Tavilê xencera xerzanî ji ber xwe deranî û li ser sînga wî danî û bi hemî giraniya xwe, xwe bi ser de dewusand. Xencer di pişta Mînas de avêt û çar tilîyan jî di erdê re çû xwar. Hêwurze bi nav gel ket; qêrîn û halan olan da. Bi vî dengî re, Ristem bi piyê meyt girt û ew heliqand nava konên Tûraniyan. Ji xuşîn û bayê ceset, leşkeren wan kher bûn, bêhiş ketin û kesên ku di bin term de man jî, ruh dan. Yên mayî reviyan.

Ristemê Zal hat malê û ew şev bêhna xwe da, derbasî oda bavê xwe bû, got:

-Bavo! Tê bîhra te, gava ez li çolê mabûm, ketibûm devê Laab û tirsiyabûm? Te ew roj min rezîl û ruswa kiribû. Min îroj Mînas kuşt wa ye meytê wî li meydana cengê maye, mrş lê datînin. Sibehê êdî dora Neynokdirêj û Abê kurê Laab e.”

Bi berbangê re, bi dengê dîkan re Ristem şiyar bû. Zerx û kumzerx, zirîç û kumzirîç, mertala ji mifriq û pola, gurzê risasî û kevnare hilanî û ket rê. Lê belê bavê wî pê re derket ber derî û nehişt ew tenê biçe; Bijen jî pê re şand. Bijen kî bû? Bijen kurê Gîwê Guhderz bû, xwarziyê Ristem bû.

Heft şev û heft rojan bi rê ve çûn û ji ser zîn daneketin, piyên xwe ji rikêbê dernexistin. Roja heştemîn, xewa Ristem hat. Bijen zanibû ku gava xalê wî serî têxe xew, heft şev û heft rojan jî şiyar nabe. Got “Xalo tu frîqet be! Ez dê li ber serê te nobedariyê bikim. Bi dilekî rihet razê û xewnên xweş

bibîne!” Ristem got: “Te çi ji xewnên min e? Tu dev ji min berde xwarzê, lê bila bal û dêna te li Rexşê Belek be!”

Kurê Zal xwe li ser mêrgê dirêj kir û niviya. Bijen li wan deveran ewle bû, çû û hat û sêwirî. Rojek, duroj buhurîn. Qilqilî û nema sebra wî hat. Bû êvar, hêdî hêdî meşiya ser girekî li nêz ku ji xwe re li dîmena rojava û li kûraniya gelî binihêre. Lê belê gava hilkişiya jor tiştekî sosret dît:

Komek keleş wa ye di newalê de agir kirine û keçikek xama jî di nav wan de ye, ew li ser destê xwe digerînin û pê henekan dikin, hire hira kenê wan li honikahîya êvarê, li quntara gir dengvedide. Geh difîkînin û geh li çepikan dixin, kêf kêfa wan e... Bijen bi çavê xwe bawer nekir, baş nihêrî û dengê wan jî bihîst. Yeko yeko ew jimart; heft keleş bûn. Keçikê xistibûn nava xwe û li dora êgir digerandin. Zimanê alavê rûyê wan sor dikir û dibiriqand. Keçik li himêzên wan dor bi dor rûdinişt. Dora kî ji wan bihatana, keçika xweşik bêhn dikir, maç

102

dikir û mizdida, dû re ew dida ke^ê li rex. Bi vî awayî ew di nav xwe de dibirin û tanîn. Keçik xemgîn bû, rûyê wê qermiçî bû û madê wê jî zer bû. Lê bêçare bû, tiştek ji destê wê nedihat.

Bijen kêliyekê li wan meyzand, paşê xwe negirt û ew jî çû di nava wan de rûnişt, ji nêzîk ve li keçikê nihêrî: Xweşik bû, heba weke wê tunebûn. Qurtek ji ava kewserê bû. Pora wê ya sor û sosinî dirêj bû, digihîşt hetanî paniyê. Lêvên wê yên tenik xweş li çena gilover dihat. Çavê wê gir, birû kevan bûn, bijangan di nav xwe de dihewandin. Hinarkên rû sor bûn û soraya xizêmê agir bi wan dixist. Ew gav agir di dilê Bijen de jî alav da! Eşkere bû ku ew ji maleke mezin û têr, ji qesr qonaxên bilind bû.

Isatvanan dora xwe nîjtin, dor hat ser Bijen. Lê belê keçik teslîmî wî nekirin, xistin himêza yê li rex wî. Bijen li vê yekê şaş ma, lê sebir kir, li hêviya careke din ma. Qîzika kej dîsa li ser destan geriya, dor hat wî, lê belê ke^ê kêlekê keçikê tan da ser hevalê xwe. Bijen nema dipa: “Hûn çima min jî nahesibênin û dora min derbas dikin? Ma ez jî carekê ew bêhn bikim, wê jê bimehe?”

Serokê keleşan tinazê xwe pê kir: “Berxê min, tu biyanî yî! Em keçikê nadin kesên xerîb! Tu rêwîyek belengaz î, hêja lîçik ji pozê te tê!”

Keçik carek din doş bû, îsatvanan ew firkandin û memikên wê guvaştin. Lê belê Bijen bêpar ma, çav li wê dîlberê zer kir. Carek dudo û sisê. Xwe negirt:

“Wah! Ez kî me lo? Hûn min çi dihesibênin? Ez Bijen im, xwarziyê Ristemê Zal im! Serokê we kî ye, bila ji min re derê meydanê!”

Gava wuha got, du keleş bi hev re xwe avêtin ser Bijen. Lê xwarziyê Ristem destsivik bû, tavilê şûr kişand û serê wan

gêndirî nav axê kir. Qîzik tirsiya xwe da kêlekê û giriya. Lê belê çavê xwe jî ji ser Bijen hîç neneqand. Her pêne keleşên din bi carekê re êrîş kirin. Li wê çola xalî ku çîvik ne digot çîk, şerekî dirinde li dar ket. Hev û din di nav axa bêav û terikî de gevizandin. Duman bi ser serê wan ket. Çend saet di ber hev dan, lê belê di eneamê de Bijen bi ser ket; serê hemûyan jêkir û guhê wan xist berîka xwe. Li keçikê zîvirî:

-Tu kî yî, li vê çolê çi dikî? Tu çawa ketî destê van şakîyan?

Keçik histêrên xwe paqij kir û bi pêçiya xwe ya eşhedê ronahîyên dûr yên nava mij û dûmanê nîşan da:

-Ez ji wî bajarî me. Qîza paşê me, navê bavê min Laab e. Du birayê min hene. Navê yekî Ab e, navê yê din jî Neynokdirêj e. Her du jî pêhlewan in, menşûr in, bi nav û şan in.

Bijen şaş ma, geh fikirî û geh li keçikê nihêrî.

-Ka bêje? Tu çawa dîl ketî? Tu çima reviyayî ji mal?

-Ez nereviyam, wan bi zorê min revand. Êvar bû, ez derketibûm sûkê bona diviyahîyên malê. Ji nişka ve du xort li hember min derketin. Bi milên min girtin û li hespê suwar kirin. Min kir hewar û gazî. Lê belê kesek di hewara min de nehat. Isatvanan devê min bi eaw girêdan û pişt re dest û piyên min jî. Min anîn vir. Demek bi şûn de pêne kesên din hatin. Li hev eivîyan û name ji kekê min re şandin. Ji bedêla berdana min, hezar zêr ji wî xwestin. Dû re agir vêxistin û bi min leyistin. Ger tu nehatana, hetanî ji birayê min bersiv negirtana, wan ez bernedidam. Xwedêkirî ku mêrxasekî mîna te serî di min re deranî û min xelas kir ji destê wan. Ez ji bona te çi bikim, dîsa ewêziya vê qeneiyê nayê eîh. Gelo ez dê çawa vî deynî bidim û ji bin vê qeneiya te derêm?

Bijen bersiv neda. Li hêviya tiştek din dipa: awur û nêrînên wê. Agir hêdî hêdî ditemirî. Tenê roniya terrafê dima. Bijen hêdî hêdî axifî:

-Tu keçek gelekî rind î. Xweşikiya te li tu kesekî nîn e. Lê çi heyf ku van bêbavan te lewutandin! Bala min li te bû, gava tu li ser destê wan digeriyayî, tu gelekî xemgîn bûyî. Wan te maç dikir, lê belê te tukesî maç nekir.

Tê zanîn tu bi rewuşt î û dilê te pak e,

Xweşikîya te wê kela dilê min rake,

Tenêtî li vê dunê feyde li tukesî nake,

Evînî wê rihê te ji vê kirêtiyê xelas ke...

Her du li eem hev rûniştin, di tarîbana şevê de pêşî çokên xwe bi hev ve zeliqandin û paşê hûr hûr li hev nihêrîn. Bêdengiya şevê, xuşîna dar û

deviyan bi wan xweş hat. Roj li wan bûn saet, saet bûn deqîqe. Li hev baniyan û ji hev hez kirin. Lê belê di wê sermestiyê de, Bijen kula dilê xwe der kir:

-Ez dê tiştekî ji te re bêjim, lê tu pê neêşî! Min te nas kir, lê tu qet napirsî, tu kî yî û li vê çolê çi dikî? Ez xwarziyê Ristemê Zal im, ji welatê Zabilistanê me. Xalê min serî xistiye xewê, wa ye li pişt gir e. ew bi mebesta eengê derket rê û min jî pê re şandin. Em dê werin bajarê we... Birayên te Ab û Neynokdirêj.

Sewtek bi hêrs, gotin di devê Bijen de sar kir:

-Wexta eşq û meşqê ye lawo? Axa Zabilê li serê şerva^ mîna te be! Tu şervan î, an dilketî û dilovan î?

Deng dengê Ristem bû, mîna ku ji kûraniya ewran dihat. Heft şev û heft roj buhurî bûn, lê belê wan hay jê tunebûn. Meqesa rastiyê, perda xeyalên Bijen çirandibû.

-Dev ji vê keçikê berde! Lez bike, divê em biçin.

-Nabe xalo! Qurbana te me! Ez nikarim dev ji keçikê berdim, lê tu dev ji me berde! Here ji xwe re razê, xewa te nîvco ma! Min ji bo vê keçikê serê heft keleşan jêkir.

Ristem bawer nekir:

-De here lo, virreko! Te dilê xwe kir dil û zilê xwe kir zil! Vêca behsa keleşan dikî!

-Ger tu ji min bawer nakî, va ye çardeh guhên jimartî di berîka min de hene!

Ristem bêhtir hêrs bû:

-Xwarziyê min! Gotina min neşkîne. Tu dê poşman bibî! Derhal keçika reben azad bike, bila here mala bavê xwe. Roj ne roja mirçe mirçê ye xwarzê!

Bijen bêçare ma, bêdilê xwe keçikê berda. Keçik jî nedixwest vegere mal, lê belê hêdî hêdî dûr ket û Bijen bi awurên şikestî lî dû wê nihêrî û di dilê xwe de axîn kişand.

-Bajarê ku Ab lê dijî nêzîk e, em divê xwe amade bikin. Lê belê tu divê li pêş biçî, elama wan pê bixînî, bêjî wa ye Ristem hat, xwe ji cengê re amade bikin. Bila Ab derkeve meydana cengê.

Kêfa Bijen bi vê xwesteka Ristem hat. Di dilê xwe de wuha got: “Dema ez herim qesra Ab, bi vê wesîlê ez’ê dilketiya xwe jî bibînim. Helbet ew’ê bibihîze ku ez hatime, ew dê serê xwe di şibakê re derxe. Ew çax, dîsa şênaya dilê min...”

Bijen bi van ramanan çindik da xwe, “deh” kir hespê û damûska wê hejand. Ristem ma li wur; xwe ji şere Ab re amade kir, li ser bincîhanîna sonda bavê xwe fikirî. Bijen bi kêf û eşq li kuçe û sûkên bajêr geriya û vir de wur de nihêrî, li qesra Ab pirsî. Ji bajarvaniyan yek, qesra Ab şanî Bijen da. Gava xwarziyê Ristem ket hundurê hewşa Ab, li ber şêmûka derî rast

106

li xuşka wî hat. Ew gav. Belê ew gav, ew deqîqe dunya li serê Bijen mor bû, kesk bû û sor bû, dilê wî kir kulpe kulp, hemî azayên canê wî lerizîn. Lêvên keçikê jî reilîn û her du hev û din himêz kirin. Xwe li hev pêçan, bi hev ve zeliqîn û nema ji hev qetiyan. Bi wî halî di derencikê de hilkişiyan, lê belê Bijen hêç bûbû, hêja li ser pêplûkê dest avêt taş^^n ber dilê keçikê. Lê belê wê got:

“Na! Li vir nabe! Em hilkişin oda jor!

Hev û din maçî bikin dor bi dor,

Dilan li hev bipêçin bikin kilor,

Çav li felekê birjînin ew bikin kor!”

Li odê hev û din miz dan. Gava Bijen ew tazî kir, keçikê

got:

-Ez ditirsim! Dev ji min ber de!

Bijen şaş ma:

-Keçê tu ji çi ditirsî?”

-Birayê min li oda kêlek niviyaye. Ger ew bi dengê me şiyar bibe, ew dê min bikuje û ez dizanim ku hûn hatine şere birayên min; ew dê serê te jî jê bike û li meydana cengê gava xalê te û kekê min dest bi şer bikin, ew dê serê te bi serê misasê ve biçikîne û nîşanî xalê te bide, di germaya şer de gava Ristem serê te yê j êkirî bibîne, ew dê xwe şaş bike û bi kuştina te xemgîn bibe. Kekê min Ab jî bi vê fersendê, ew dê keysê lê bîne û serê xalê te bifirîne.

Bijen li keçika xweşika ku wek bîhokê bû, êdî ariya bû. Di dilê xwe de got: “Naziyê keçikan xelas nabin! Vê bêbavê xwe bi min şêrîn dike!”

-Qala şer û pevçûnê neke,

Tu delingê ji min re veke,

Ezîzê ber dilê te dişewute,

Nazi û fenan qet lê meke!

Dû re wuha got:

-Tu niha li kêleka min î û di ber dilê min de yî! Êdî tiştek li ber çavê min nayê. Kî tê kuştin, kî di cengê de têk diçe, ne xema min e jî! Piştî ku tu bi min re bî, mirin jî ji min re dawet e. ez bi bêhna te sermest bûm, ma tu

nabînî? Bila birayên te werin, serê min jêkin û bi serê misasê ve girêdin û li meydana cengê şanî xalê min bidin û ew jî bila xwe şaş bike û ji alî Ab ve were kuştin! Bila wusa bibe! Bila qenc û xweş bibe! Ew gav bila dilê min di xalê min Ristem de rihet bibe! Tê bêjî çima? Hema wusa! Min hetanî te ji destê wan heft keleşan xelas kir, min dunya wî alî dît; kefte left bi ser min ket, hindik mabû ez bihatama kuştin. Min bi çi kul û halî te ji wan xelas kir. Ristemê xal çi kir? Tewer te ji min sitend û berê te da malê! Mêraniya xwe li min û te kir, evîndariya me da ber xenceran û qet...

Gotina Bijen bû cemed û bi ser zimanê wî ve zeliqî. Zilamekî dirêj û zexm, mîna îzbandût ket hundur. Keçik tavilê ji nav nivînan pengizî û xwe çengî ser wî kir. Zilam li hev şaş bû, hêja rewşê fam nekiribû, keçik ji paş ve bi her du milên wî girt û bang li Bijen kir:

-Bilezîne, ên^ bike! Ger ji destê min bifilite û keysê li te bîne, ew dê te bikuje! Ha ji te re vî şûr î! Rake şûre wî û li sitûyê wî bixe! Ger tu ew nekujî, ew dê te bikuje malxerabo! Gidî ji bo Xwedê zû bike!

Ew gav, keçik şûr jî ji destê birayê xwe girt û bi erdê re xişikand cem Bijen. Lê belê xwarziyê Ristem qet ji cîh nelibitî, hêja sermestê evîniyê bû:

-Bila min jî bikuje û te jî! Bila serê min di cengê de şanî xalê min'ê kezebkevir bide, bila ew jî bê kuştin ku dilê min lê rihet bibe!

Şûr bi erdê re şemitîbû û li ber piyên Bijen sekinî bû. Bijen rahişt şûr û mîna ku bêje "ez naxwazim", cardin bi şûn de heliqand bal keçikê, got:

-Ha ji te re! Şûr dîsa bide xwedî!

Lê belê kêliya ku Bijen şûr bi şûn de heliqand, şûr pengizî û bêhemdî li sitûyê birayê keçikê ket û sitûyê wî ji kêlek de hetanî sîngê çirand. Xwîn pijiqî û kurê Laab li erdê perpitî. Bijen di cîh de şeqizî, gava çav bi xwînê

ket madê wî zer bû. Hêja nuh ji sermestiyê hişyar bû. Çavên wî vebûn. Vêca halan di xwe da, ji birîndarê erdê re got:

-Ez kî me lo! Bijenê xwarziyê Ristemê Zal im! Ez wuha mîz dikim devê pêhlewanên mîna te! Ez mêran di mala wan de wuha wesle wesle dikim!

Keçik û Bijen ew kuştin, serê wî jê kirin, bi serê dar ve girêdan û bi dizîka ji qesrê derketin. Ji alî din ve, şere Ristemê Zal û Abê kurê Laab dest pê kiribû. Her du pêhlewan ewul bi şûran dû re bi gurzan li hev xistibûn, geh li erdê bi hirê fêris û pêhlewanan û geh jî li ser pişta hespan sihêtiya hev û din kiribûn û li dû hev doş bûbûn. Dema Bijen û xuşka Ab gihîştin meydanê, ceng li dar bû û her dû pêhlewan êdî di hev de nerm bûbûn û xwêdan dabûn. Hesp li aliyekî bûn, şervan li ser axê digevizîn. Ew gav Ab keys li Ristem anî û piyê wî şemitand û ew girt bin xwe. Temaşevanan jî nefesa xwe girt. Bêhn, digel pêhlewanan li hemîkesî çikiyabû. Qirik zuwa bûbûn, çav jî sor.

Ab xencera ber xwe deranî û bi destê rastê bilind kir. Kurê Zalê, serlehengê Iraniyan hilma xwe ya dawîn sitend û sînga wî cara paşî libitî. Rexşê Belek li kêlek bû, pozê xwe bilind kir. Gelê bajêr ji Ab re li çepikan xistin. Lê belê ew gav dengek ji nav elaletê bilind bû: “Keko! Raweste!” deng dengê xuşka wî bû, xwediyê deng nas kir, lewma Ab rawesta, serê xwe rakir û li xuşka xwe nihêrî. Serê Neynokdirêj bi serê dar ve bû û çavên wî ji dûr ve sipî dikir, zimanê wî buhustek ji dev daleqiya bû. Ristem ew gav ev fersend berneda, ji nişka ve hema ji cîh hilqevizî û bi çalakî Ab ji ser xwe tan da. Kurê Laab li erdê şelişî. Ristem nehişt ew were xwe, tavilê şûr kişand û avêt serê wî.

Hetanî wê gavê Bijen nizanibû ew kesê ku serê wî bi dar ve girêdabûn Neynokdirêj e. Piştî ceng xelas bû, Bijen milên xwe li sitûyê xuşka Ab pêça û ew her du bi Ristemê Zal re vegeriyan Zabilê.

Gava nûçeya kuştina Ab, serkeftina Ristem gihîşt Zabilê, Zalê kokim rabû, ferman da; derê gencînê da vekirin, zêr û zîvan li gel da belav kirin. Li ser bextê Ristem û pêhlewaniya wî şahiyekê li dar xist. Govend geriya û şerab herikî. Li gor urf û adetên Keyaniyan, bona gel bi vegera Ristem bihesênin, sitekanek bi taybet û mohrekî ji heft madenan çêkirin, ew li ser pişta fîlekî bincîh kirin. Mohrê avêtin nava sitekanê; dengek ecêb jê belav bû, gihîşt hetanî heft bavên eşîran û serê çiyayê Elbûrzê, nav hêlîna Teyra Sîmir.

Ristem vegeriya Qela Zabilê, li ser textê bavê xwe rûnişt û bang lê kir:

-Bavo rabe, por û riha xwe biqusêne. Ad û sonda te bincîh hat, êdî Ab û Neynokdirêjê kurên Laab ji ser rûyê dunê koç

bûn, pişta me ket felekê, berê me ket oxirê. Stêrka Mala Zalê hilat, va ye diçirise û dibiriqe.

Zal, bawerî bi kurê xwe anî, qinyata dilê wî çê bû: Ristem êdî mîna gîsinê seqakirî di şer û cengê de pijiyabû. Bang li heft sertaşan kirin, por û riha Zalê Zêrîn bi heft dûzan û heft meqesan qusandin.

6.

Zalê Zêrîn bang li kurê xwe kir, ew bir odê, cîhê mêhvanan, dîwanxana paşa û camêr û ekabîran. Li wur, li tenişta xwe da rûniştîn û jê re wuha got:

-Piştî Newzer, padîşahek zîrek û zana nebû serokê Iranê. Niha Tûranî diranan li me diqirçînin. Ji Iranê re Şahek divê. Mêrxasekî ji malbata Keyanîyan divê bikişe ser text. Artışa me bihêz e û pêhlewanên me jêhatî ne, lê mixabin text vala ye. Kesê ku kembera Keyanîyan bide pişta xwe divê şervan û wêrek be. Remildaran deh sal berê behsa xortekî ji nesla Ferîdûn kiribûn; navê wî Kûbad bû. Ew niha li çolê ye, li ser çiyayan, di

nava geliyan de dijî. Tac û textê Iranê heqqê wî ye. Lawo, roj roja te ye, nesekine û here çiyayê Elbûrzê, Kûbad ji wur bîne. Riya wur, du hefte dajo. Silavên min jê re bêje, bêje ad^ş amade ye û kursîyê bav û kalan li benda te ye.

Ristem tavilê ji cem bavê xwe rabû, li ser pişta Rexş rûnişt; caniya belek hîrîya û bi rê ket. Pênc şev û pênc roj nesekinî, hetanî betilî, nêzîkî çiyayê Elbûrzê, li cihekî daristan û avgîr rawestiya. Nihêrî ku komek xort li nav daran rûniştine û

bi hev û din henekan dikin. Gava Ristem nêzîk li wan kir, ew ji cîh hilqevizîn û rabûn piya, Ristem xwe gihand cem wan.

Serokê wan pirsî:

-Tu kî yî? Çi kes î?

-Ez Ristemê Zal im.

Li hev nihêrîn. Şaş man, nav û dengê Ristem bihîstibûn. Ristem bi tena serê xwe li wê çolê çi dikir?

-Em te dinasin. Me bihîstiye ku tu pêhlewanekî jêhatî yî. Tu diçî ku?

-Diçim çiyayê Elbûrzê.

-Em naxwazin tu îşev biçî, bibe mêhvanê me, bi me re bimîne, em dê kêf û henekan bikin û meyê vexwun, sibehê têkeve rê.

Ristem:

-Xwesteka we li ser serê min û ser çavê min, lê belê ez bona karekî girîng diçim Elbûrzê, ne ji kêfa. Ger ez dereng bimînim, ji bona min ne baş e. Dijmin çav berdaye axa Iranê, lê mixabin serok û şah ji me re nîn e. Text vala ye. Di hel û mercên wuha de ez dê çawa bi we re kêf û zewqê bikim û xwe sermest bikim?

-Tu bo çi diçî çiyê? Tu li kî digerî? Ji me re eşkere bêje, em mirovên Elbûrzê ne.

-Li wur mirovek pîroz û pak heye, ji malbata Ferîdûn e, jê re dibêjin Kûbad. Hûn cîhê wî dizanin gelo?

Yek ji wan tavilê derket pêş:

-Ez dizanim. Ger tu ji ser hespê xwe dakevî û bi şewqa rûyê xwe me ronî bikî, ez dê cîhê wî ji te re bêjim.

Ristem ji Rexş daket xwarê. Bi wan re çû bin siya darekê ku li qeraxa çem bû. Serokê wan, sitekanek ji meyê dagirt û da Ristem, bi destê wî girt û wuha axifî:

112

-Te li Kûbad pirsî. Te ev nav ji ku bihîst?

-Ji bavê xwe. Bavê min Zal got here silav bike û mizgînîyê bide Kûbad, bila were taca Keyanîyan bide serê xwe.

Xort keniya, “Kûbad ez im” got. “Ger tu bawer nakî, ez dê niha hemî navên bav û kalên xwe ji te re bijmêrim!”

Ristem bi guhên xwe bawer nekir, tavilê bejna xwe li ber wî tewand û bang kir:

-Ya Padîşahê Cîhanê! Dergahê herî mezin! Gelê Iranê hemî li benda te ne! Min silav û hurmetên Zalê Pîroz ji te re anî.

Kûbad bi Ristem bawer kir û şeraba xurma jê re anî, li ser şerefa mêhvandarîya wî, bi hev re “noş” kirin. Ew gav dengê mûzîkê û defdefkan hat, xort li wan civîyan. Yek ji wan helbestek xwend bi dengê êlî:

“Roja xweşî û şahîyê ev roj!

Ristem li cem Kûbadê dilsoj.

Bêje dengbêjo, ka Cemşîd kî bû?

Xelkê derb û mêranîya wî dîtibû!

Di kêfê de bixeniqin,

Bi sitranan veciniqin!

Meygero! Ka mey li ku ma?

Noş! Ji rûmeta paşa ra!

Sakîyo lo! Ka sitekana Cemşîd bîne,

Zeng û xema dilê me pê bihelîne!

Rûyê xwe nezîvirîne ji evînê,

Ji hunguv, şewq û şeraba şevînâ.

Jixwe, felek hertim bêhawa ye,

Pê re nekeve heft û heyşta ye.

Meya xwe ya rengsor vexwe,

Li nav xwîna dilevînan nexe!”

Kûbad ji Ristem re xewnek xwe got:

-Min şevr din dît ku du başokrn spî, tac li ser basikên wan, ji alî Iranê ve bi alî min ve difiriyan û dihatin. Tac li ber şewqa rojê dibiriqî. Başok hatin li ser milên min danîn, tac danîn serê min.

Ristem got:

-Ev xewn nîşana şahînşahiyê ye ku ji te re kufş bûye. De rabe û nesekine! Em dê herin Iranê.

Kûbad rabû û piyê xwe xist zengûyê zîn. Ristem jî kember li nava xwe pêça. Her du ew gav derketin rê û bezîyan. Xortên hevalê Keykûbad jî dan

dû wan. Çûn û hey çûn. Ew bila li rê bin, em werin ser Tûranîyan. Gelo Efrasiyabê Bavpêşeng çi dikir?

Efrasiyab agahdar bûbû ku Ristem çûye çiyayê Elburzê da Kûbad bi xwe re bîne Iranê. Biryar da ku pêşiya wan bibire. Bona vê yekê ferman da pêhlewanan bo amadehîya cengê bikin. Pêhlewanekî wî hebû, navê wî Qalûn bû. Yekî jêhetî û çeleng bû; şervanekî gelekî meşhûr bû.

Kûbad gava çav bi artışa Qalûn ket, hevalên xwe ji cengê re amade kir, lê belê ew gav Ristemê Zal hêrs bû, got:

-Hewce nîn e paşayê me. Ez û Rexşê Belek ne bes in ji wan re? Zerx û zirîçên min, gurzê kalê min Sam têra wan dike!

Dilê min yê sot, masûlkên min yên hesinî û gurzê kalanî alîgirin ji min re.

Hespê hêç rabû ser piya û hîrîya. Rostem ket nava artışa Qalûn mîna ku şêrekî têkeve nava kerîyê pêz. Bi leşkerekî girt, li bin guhê yên din xist, gurzê xwe li çar alî hejand, bi pencên xwe bi zeqema suwariyan girt û ji ser zîn avêt erdê, sitûyê wan şikand. Qalûn ev rewşa Ristemê hêçhêçe dît û ew mîna dêwekî fesiland. Dêwekî ku ji qeyd û zîncîran filitî bû. Nihêrî ku ew dernekeve pêş, hemî pêhlewanên Tûranî dê biteriqin û belav bibin. Lewma xwe negirt û hespê xwe bi çargahvî ajot ser Ristem; ji nişka ve rima xwe li bedena wî xist, rim negehîşt canê wî, lê belê zerxê wî çirand. Ristem tavilê li ba ket û dest avêt rima wî û ew jê sitend. Qalûn li wêrekîya wî şaş ma. Ew gav Ristemê Zal halan di xwe da û mîna ewrên buharê gurre gurr pê ket. Rimekî bi ser Qalûn ve şand. Pozê rimê di canê fermandarê Tûranî de çikîya û ew ji ser zîn avêt xwarê û mîna çûka li şîşê li erdê perpitî. Pêhlewanên wî lê temaşe dikirin. Ristem Rexş ajot û ji wur dûr ket, suwariyên Keykûbad jî dan pey. Bi hev re çûn cîhekî avgîr û hêşîn. Hetanî tarîbana şevê ket erdê, li wur bêhn berdan.

Çend roj bi şûn de êla wan gehîşt Iranê. Ristem Kûbad bi xwe re bir Zabilistanê cem Zal. Li wur zana û porspî, zîrek û mûbîdan civandin. Biryar dan ku ji bilî Kûbad dê kesek neçe ser text û nebe “Key”. Piştre heft roj û heft şev pîrozbahî li dar xistin û şahî kirin. Roja heyştan Keykûbad hilkişiya ser textê ji diranên fîl û taca Keyanîyan da serê xwe. Piştî ku Keykûbad li ser text rûnişt, Zalê Zêrîn bang li hemî pêhlewanan kir; Karenê Şerûd, Pêşwad û Xerat û Berzîn li hev civand. Zîv û zêr bi ser taca nûh ve reşandin. Pêhlewanan ji Şah re pêşnîyaziya xwe eşkere kirin: “Rewş xerab e, li dijî Tûraniyan ceng divê!”

Keykûbad ferman da, qumandaran artdşd ji şer re amade kirin, dotira rojê jî leşker derxistin rê.

Li prşiya artrşr Ristemê Zal bi kum û kolosê xwe, li ser pişta Rexşr Belek ku zînê Entabî li ser bû û bi şirik û gulikan xemilandî bû suwar bû, ji awurên wî yên tûj çirûsk dibariyan. Ji hilma wî ya germ fimikên pozê wî geh fireh dibû û geh teng. Simbêlên wî li ber bayê nefesa wî direilîn. Gurzê pola da ser milê xwe û mîna fîlekî hêç li pêş çû. Li aliyekî xezûrê Zal, paşayê Kabîlê, ango kalikê Ristem Mîhrab cîh girt, li milê din jî Gustehemê Xezebê û Geşwat, li navendê jî Karenê Şervan hesp ajot. Lê belê heçî giregir û rêvebir bûn; Zalê Zêrîn û Keykûbad li paşiya êlê bûn. Ala Kawayê Hesinkêr bi rengê xwe yê pîroz, zer û sor, li pêşiya wan li ber bayê pêl dida. Xêbetên Keyaniyan ji mertalan ve xilbe bûn; deşt û zozan, çiya û newal ji mertalan nedixuya. U şûr jî gelek bûn, di nava wan de mîna meşalan dibiriqîn. Mîna ku rûyê erdê deryayek reş bû û şûr jî di nav de mûmik bûn.

Hêza Tûraniya jî ne hindik bû. Li alî milê rastê Ecnas û Weys û li alî çepê jî Şemasas û Gersiyûz serê hespan çîk sekinandibûn. Gava ji her du araşan dengê defa cengê û zengilê Hindê bilind bûn, şere egît û fêris û pêhlewanan li meydanê qewumî. Hêwurzeyek rabû, bi şingîna şûran re

qêrîn hat. Piştre jî nalîna birîndaran. Dûxanek rabû ku ya star! Erd, destê ezman maç dikir, simên caniyên hêç wulo tûj bûn ku pola jî mîna heriyê dieçiqandin. Ax jî di bin nalê wan de weke ewran diçû û dihat. Serê riman bi stêrkan ve dizeliqî û sotikên ar ji wan dianîn xwarê. Ji navenda cengê dengek dihat:

“Hewar e, hewar e, sed û bîst carî hewar e,

Rabin; pût û senemê xwe, qevza ruhan bikin îcare,

Ristemê Zal li meydanê bûye mîna gurê hare,

Hezar pêhlewan lê civiyane, lê kesek pê nikare!”

Di nava hengama şer de, Karen xwe gihand Şemasas, pêşî xwe pê da nasîn û dû re jî şûre xwe yê bijehrî, tûj û biriqokî avêt serê wî û ew ji ser pişta hespê gêndirî ser axê kir. Li alî din Ristem bang li bavê xwe kir:

“Bavo, qurbano! Tu kurê Pêşeng dinasî, ka nîşanî lawê xwe bide ku ez niha te jê xelas bikim! Ka bêje kincên wî çi reng e û ala wî li ku deverê çikandiye? Ez û wî, em dê sîng li sîngê şer bikin, Xwedê da kî ji me! Ger felek hevalê min be, ez dê ew bi erdê re kaş bikim û bînim ber piyê te bona sola te maç bike.” Zal got:

“Lawo Ristemo! Dîn mebe, har mebe! Hiş eql bi te re nemaye? Ew Tirkê ku tu ji min dipirsî, mîna ejderha ye, agir ji hilma wî alav dide. Gava tê xezebê ewrekî reş û tarî li ser serê wî çê dibe û zîpikên ji kevirên sor û sincirî dibarîne. Ew ne mîna Ab û Laab û Neynokdirêj e. Jê re dibêjin Efrasîyabê Bavpêşeng. Kincên wî ji rengê ala wî ye, reş e. Milên xwe bi hesin pêçaye. Li ser kolosê wî jî ala reş dixuye. Zerxê wî bi zêr neqişandî ye. Xwe ji wî biparêze kurê min, bila haya te jê hebe. Keysfile ye û gelekî şiyar e!”

Ristem wuha li bavê xwe vegerand:

“Xema meke, xem xerab in bavo! Kuştin jixwe riya mêran e, mirin jî fermana Xudayê şev û rojan e. Dilê min yê ji mifriq û masûlkên min yên hesinî û şûre min yê tûj besî hemîyan e.” Rexşê Belek rakir telebê,

Bi hêrs û zerp û kerbê...

Caniyê dûv tûj û qirik rep,

Hêç û tox, dîn û har û bi zerp!.

Wuha ket navenda artdşa Tûraniyan. Dema dengê halana Ristem gehîşt guhê Efrasîyab, ew ji cîh nelibitî, ji pêhlewanên dorhêla xwe pirsî:

“Ev conegayê ku sîngê xwe rakiriye û tewla xwe qetandiye kî ye gelo? Navê wî çi ye?”

Kesên li rex wî wuha gotin:

“Ew neviyê Samê Nerîman e. Jê re dibêjin Ristem. Serkêş û serdarê Zabilistanê ye. Di cengê de hem av e û hem jî ar e. Gurzê destê wî nabînî? Ew gurz yê kalê wî Sam e.”

Efrasîyab xweşmêr bû, mêr di ser pozê xwe re nedidît, ji tu pêhlewanî re mil dananî bû heta wê gavê. Hespê xwe ajot pêş û pêla leşkeran vekir hetanî xwe gihand navenda şer. Ew gav Ristemê Zal çev pê ket, tavilê lingê xwe li zikê Rexş şidand û nêzîk bi wî kir. Bi gurzê xwe yê ji mifriq û pola li sitûyê paşaya Tûranî xist. Efrasîyab jî nesekinî, hema şûr ji ber xwe kişand. Lê belê Ristem xwe ji ber da alî û zîvirî keys lê anî; bi kembera wî ve zeliqî û ew ji ser zîn anî xwarê. Kurê Zal nedixwest wî bikuje, lê dixwest ew bi erdê re kaş bike û bibe cem Keykûbad. Lê mixabin ew gav tiştek qewumî; kembera Efrasîyab qetiya û ew ket ser axê. Pêhlewanên wî hemî lê civîyan. Bi vî awayî ji destê Ristem filitî. Ristem bo vê yekê gelekî hêrs bû û ji eksa dil destê xwe gez kir. Wê kêliyê, dengê def û boriyan, zengil

û elbanan ji bin çadira Keykûbad belaw bû. Pêlewanên Iranî dîtibûn ku ala Efrasîyab wunda ye; fam kiribûn ku Ristemê Zal keys li wî aniye. Lê belê rewşê bi tevayî fam nekiribûn.

Pêlewanên Tirk, Efrasîyab bi piyatî revandibûn û ew ji navenda cengê deranî bûn. Dema Efrasîyab hat xwe, tavilê pê xist zengû û xwe bi ser pişta hespê ve şidand, bi çolê ve ajot. Artışa Tûranîyan bêfermandar û serok ma. Keykûbad bang li pêlewanên xwe kir: “Lêxin çavê mino lêxin! Lêxin xwediyê

118

mino! Wan ji ser hespan gêndir bikin. Bila hukma mêrxasên Zabil û Kabîlê bi çavê serê xwe bibînin!” Zal li aliyekî û li alî din xezûrê wî Mîhrab şer dikirin. Xencer li ber şewqa rojê diçirisîn. Tîr û riman birîn vedikir. Ji nalîna birîndaran û halanên egîtan hêwurzeyek û qarewarek wulo rabûbû ku deşt û zozan dilerizî. Brûskê jî rehmet dixwend. Ax sor bûbû. Ristem bi gurzê xwe yê di şik^ serê ga de, li neyaran dixist û wan mîna pelên darên payizê ji ser hespan diweşand erdê. Deşt seranser ji pê, serî û milên mirovan tijî bûbû. Xwîn, tev li axê bûbû û di nava simên caniyan de dieçiqî. Herî û teqan çêbûbû. Tûranî reviyan, di ber bajarê Mûxanê de buhurîn, êla xwe birin alî Dameganê û paşê ji wûr xwe berra alî çemê Ceyhûnê dan. Dilê wan bi birîn bû, çekên wan şikestî bûn û kemberên wan qetiyayî... Dest û piyên wan seqet, def û boriyên wan wunda bûn. Gelek leşkeren wan dîl ketibûn û Iranîyan terş û talanên wan li mihîn û qantir, deve û fîlan kirin, anîn Iranê.

Gava Efrasîyab vegeriya malê, hilkişiya oda jor, cem bavê xwe Pêşeng. Jê re wuha got:

“Guneh û zerara vê cengê hemî di sitûyê te de ye. Bi fikra te, textê Iranê dê vala bimana! Welatê Iranê bê padîşah dimîne? Rabe, xebera nexêrê bibihîze: Kûbad bûye şahê Iranê! Keyanî dîsa kîn û buxdê belav dikin li dunê. Suwariyek ji malbata Sam heye di nav wan de ku neyê pêşiya tu kesî! Kurê destan e, navê wî Ristem e. Rûyê axê bi nefesa xwe dişewutîne. Ne newal li ber wî newal e û ne jî çiya çiya ye! Art^ş li ber wî bû mîna gajo pij û ji hev belav-welav bû. Kêliya ku ez û wî em gehîştin hev, mîna mêşekî hilbigre bi min girt û ji ser hespê anî xwarê. Baş e ku kembera min ew gav qetiya, ez ketim erdê û ji destê wî xelas bûm. Ew dêw e, qeweta ku pê re heye, bi şêr re jî nîn e. Piyê wî li erdê ye, serê wî digihîje ezman. Ez di destê wî de bûm kêzik!

Ez eşkere dibêjim; ez bi wî nikarim bavo! A baş ew e ku bi Iranîyan re aşîtî divê. Êdî dev ji tolhildan û xerezê berde bavo. Ew dê dunya li serê me bikin tara bêjingê. Prşiya gotiyê kesê ne li şer e şêr e; min dîtiye, lê tu nebîne. Ev hevîr hêja wê gelek av hilîne! Ka pêhlewanên me? Ka Barman, Şemasas û Hazervan? Me jî gelek xerabî bi wan kiriye heta niha. Ez înkar nakim. Lê bes e. Niha divê tu biryarek bidî û bi Keykûbad re aştiyê çêbikî. Ya na, xelasiya me ji destê kurê Zal, Karenê Şerûd, Geşwatê Kumzêr û Paşayê Kabîlê nîn e.”

Çavê Pêşeng şil bû. Li van gotinan heyirî ma. Bang li katib kir û nameyek da nivîsandin. Nameyê bi birayê xwe Wîse re şand paytexta Iranê. Di nameyê de wuha got:

“Rehma Xwedê li Ferîdûnê pîroz be! Ya Keykûbadê bi nav û deng! Ne bi devê dijminiyê, lê vê carê li ser heqiyê ez dê çend gotinan binivîsim. Divê em êdî dev ji şer û pevçûnê berdin. Bav û kalên me, bi salan ceng kirin. Ka çi bi dest xistin. Em dixwazin li ser edalet û dada Ferîdûn li hev werin. Di dema wî de jî Mezopotamya axa me bû. Lê belê Iran yê we ye. Em vê yekê qebûl dikin. Em jî dikarin mîna Ferîdûn bikin; tê bîhra te ku wî axa

herêmê di nava Selm, Tûr û Ireç de parê kiribû. Pora Zalê Zer spî ye mîna berfê. Lê belê ax bi xwîna pêlewanan sor bû! Jixwe taliya me mirin e û berîka kefen jî nîn e. Ger Keykûbad guh bide van gotinan, êdî di xewnê de jî hûn leşkerân Tûranî li nêzîkî çemê Ceyhûnê nabînin!”

Pêşeng, bi vê nameyê re dîyarîyan jî şand: Tac û textekî ji zêr, qew^ên xweşik û kemberzêr, hespên Erebî û şûran Hindê yên destîzîv.

Bersiva nameyê dereng nema; Keykûbad wuha got:

“Kî pêşî şûr ji kewdan kişand, ev eşkere ye. Gava Ireç çû û textê Şah vala ma, Tûr bêheqiyê nekir? Efrasîyab jî mîna wî

120

kir. Nihêrî ku textê Iranê vala ye, baskê wî şîn hatin! Wî çi ji Newzer kir, tu jî dizanî. ^tê ku anî serê Axrîres jî nayê ji bîr kirin. Lê xerabî li paş ma. Mafir ku hûn poşman in û peymaneke nûh dixwazin, ez jî vê yekê qebûl dikim. Ez ji belayê re jî amade me û ji aşîtîyê re jî.”

Peymanek di nava Iranî û Tûraniyan de hat çêkirin. Pêşeng hemî leşkerân xwe ji tuxubê Iranê kişand. Keykûbad gelek kincên nexşkirî ji Ristem re şand û taceke zêrîn jî li ser. Kembera zêr jî bo wî amade kir û ji Zal re name lêkir:

“Tac û textê mezinahî û mêraniyê bila tucar ji Zalê Zêrîn dûr nemîne! Li ber çavê min, hemî rûyê erdê ne bedelê neynoka te ye. Kincê padîşahiyê ji te re ye. Ew layiqî te ye. Gencîne jî hergav ji te re vekirî ye.”

Dû re pênc fîl amade kir, li ser wan palasên zêrînî raxist, kincekî ji zêr honayî, tacekî ji aqût û kemberek ji fîrûze nexşkirî jî bar kir û şand.

7.

Sal derbas bûn, şert^n Iranê guherîn, dewra Keykûbad xelas bû. Qesr û seray, tac û text dest guherand, malûm e, taca zêrîn ebedî li serê kesekî namîne, Kûbad çû, Kawûs di dewsa wî de rûnişt, li paytextê taca Şehînşah da serê xwe û li ser kursîyê Ferîdûn cîh girt. Bona vê roja dîrokî û pîroz biryara şahiyê dan, rêvebiran gel civandin. Zalê Zêrîn porspî û şêwurmend bû; di rojên wuha de bê axaftin nedisekinî; rabû piya û ji Keykawûs re wuha got:

"Ya mezinê mezinan! Ya Şehînşahâ îranê! Ez hêvî dikim hemî rojên te mîna niha di xweşiyr de bibuhurin. Tu bextewar bî! Him zana û him jî adil! Lê belê min tiştek bihîstiye, ez nikarim veşêrim. Di nava gel de nûçeyek belav bûye; dibêjin Kawûs piştî ku bû Şah, bona hêza xwe biceribîne û çavên neyaran bitirsîne, wî biryar daye ku art^ê bişîne welatê Mazenderanê. Ne heddê min e, lê bibexşîne şîreta min ji te re heye. Mirovên xwey eql û îzan divê ji kesekî gazinan nebihîzin. Ya duduyan; bapîrê te Cemşîd e. Tac û textê wî ji rojê bû, tewer wî jî hewl neda xwe ku pêlewanan bişîne nava Mazenderanê. Ferîdûnê ku qesra Dehhaq bi ser serê wî de hilweşand, dîsa jî tiştekî wulo di eqlê xwe de derbas nekir. Berî te gelek dewr û zeman buhurîn. Minûşîr hilkişiya ser text, piştî wî Newzer û Zev û Keykûbad hatin û çûn. Gelek pêlewan û mêrxas di bin fermandariya wan de hebûn. Şûr û gurz, tîr û kevan, kemend û mertalên wan jî gelek bûn. Dîsa jî li dijî Dêwên Mazenderanê çok neçikandin. Ew welatê dêwan, pîrebok û remldaran e. Kesek ji sêra wan fam nake. Nepeniyên wan gelek in. Ew welat bi darê zorê nayê sitendin û bi zêran jî nayê kirrîn. Dar ku bi xwînê avdayî be, fêkî nade!"

Keykawûs li Zal guh dêrand, baş lê nihêrî û kûr fikirî. Dû re bersiva wî da:

"Pêdiviya min bi şu^n te heye helbet. Lê belê ji bîr meke; ji alî mêranî û zengînîyê ez ji Minûşîr û Keykûbad, tewer ji Ferîdûn jî pêşdetir im. Xizîne û artışa min jî pirtirîn e. Rûyê erdê di bin şûre min de dilerize. Gava ez

şûre tazî hildim jor, deriyê hemî welatan dê vebibe li ber min. Ez dê kemîn li pêşiya dêwan deynim, cengê li dar bixim. Bila di bin hukmê min de her sal bacê bidin. Heke nedin, ez dê welatê wan kambax û wêran bikim, kuç li ser kuç nahêlim. Pîrebok û dêw û sêrbaz ji

122

min re hîç in! Tê bibihîzî da ez dê çi bînim serê wan! Tu û Ristemê xwe li welêt bimînin û şîyar bin bes e."

Zal lê wekiland:

"Ez dîsa dibêjim. Min rewşê bi dilekî xemgînî ji te re eşkere kir. Lê belê Şah tu yî, ne ez im! Tu zulmê dikî tu zanî, dadiyê bincîh dikî tu zanî! Kesek ji mirinê xelas nabe û nikare derziyê jî di çavê felekê de qûç bike, dem û dewranê kor bike. Ez çi bêjim; dunya ronî bila li te pîroz be! Hêvî dikim ku tê dibîranîna van gotinên min de mecbûr nemînî û li xwe poşman nebî!" Zal, piştî axaftinê ferman da Tûs û Guhderz da art^ê bi rê bikin. Dema berbang lê xist û roj hilat, Şah û pêlewanan berê xwe dan Mazenderanê. Kawûs mufta gencînê, taca serê xwe û gustîlek zêrîn teslîmî pêlewanê xwe Mîlad kir.

Çend roj bi şûn de Keykawûs, qerargeha xwe li qûntara çiyayê Espîrozê damezrand û serî xist xewê û hetanî roj çû ava ew di xew de ma. Gava şîyar bû, pêlewanan civand. Kawûs gotina pêşî ji Gîw re got: "Du hezar leşker ji min re bibijêre. Yên jêhatî bineqîne û bîne. Bila karibin bi gurzan cengê bikin. Em dê derê Mazenderanê bi gurzan vekin. Tu li pêş here Mazenderanê, rojê li wan bike şev, bajar li wan bike dojeh, bila goştê wan bipije û biqijile. Sêhrbaz û pîrebokan biqelîne."

Gîw, digel pêlewanên neqane û şervan ket Mazenderanê. Bi ser gel de şûr û rim, tîr û gurz barand. Ne jin û mêr, ne jî zarok û extiyar hişt. Her alî

şewutand û kî ket ber wî qetl kir. Li dû xwe arî û dû, xwîn û laş, nalîn û qarîn hişt. Qesr û qonaxa padîşah ma. Li wur cariyeyên guharzêr û rûheyv hebûn. Zêr û zîv li qirikê bûn. Her cîh bi qumaşên Çîn û Maçînê, bi gul û sosinan xemilandî bû. Qîz û bûkên wan, nola hûriyan bûn.

Di demek kurt de, îranî dev ji xerakirin û talanê berdan. Lê belê padîşahê wî welatî her tiştî dizanibû. Ji dêwê li rex xwe

re (ku navê wî Sence bû) wuha got: “Mîna heyvê bilez here, xwe bigihîne Dêwê Spî. Jê re bêje hal û mesele ev e; artrşek giran bi ser me ve girtiye, terş û talanên me, erz û eyalên me hemî dan bin piyan. Jin û zarok, extiyar û zana nehiştin. Kuştin, kuştin û kuştin. Serokê wan Kawûs e. Ger tu lez nekî û negihîjî me, li Mazenderanê çivîk jî namîne. Giya jî wê êdî şîn nebe li ser vê axê.

Sence nesekinî, xwe zûka gihand cem Dêwê Spî, jê re her tiştî got. Dêw wuha bersiv da wî: “Bêhêvî nemîne, artışa Iranê ya giran bila xema nexe dilê te. Ez dê niha bi êla xwe û digel pêlewanan werim û piyê Kawûs ji Mazenderanê qut bikim.”

Dêwê Spî pijiqî, mîna çiyayekî herikî; mîrato volqan bû, agir jê alav dida. Rabû piya, haziriya cengê kir. Kawûs jî li çiya û berrîyan, li newal û qotan konan vegirt, ala xwe kişand, li her alî çikand. Çadirên wî xilbe bûn û bêhesab bûn; gava tav li wan dixist mîna pêlên deryayê dixuyan, çavê mirov li ber wan venedibûn. Şah di navenda wan de konê xwe yê sultaniyê ku ji bilûr bû vegirt, kumê pederçahiyê da serê xwe û li ser rûnişt. Pal da û mîna carê ji caran pêlewan û fêrisan li xwe civand: “Egîtên mino, cengawerno! Em dê niha bi hev re rabin û berê xwe bidin bajarê Mazenderanê. Veger û rev ji me re nîn e. Roja namûsê ye. Kî ji meydana şer baz de çarika jina wî li sera be! Em dê bikişin weke şêran têbikoşin û dor li wan bipêçin, dagir bibin bi ser bajarê mezin de, em dê ne paşa bihêlin û ne jî leşker. Bila zanibin da arî kî ne! Em dê serê wan di bin nalên

hespê xwe de bipelçiqînin. Hetanî serî pêl nekin, em ji ser sînga wan ranabin. Weke qinyata dilê xwe, em dê bi wan re bikin!”

Şev hêdî hêdî, mîna marê nava pûş bi dizîka dageriya bû. Zulûmat her cîhî wunda kiribû. Ewrekî reş û tarî jî pê re hatibû û bi ser Kawûs û artışa Iranê ve girtibû. Dunya bûbû çadira ji

124

qîrê, lê belê wan hay jê tunebû, ketibûn galgalê. Dûxanek reş ji ezman dihat jêr û bi ser rûyê axê ve belav dibû. Te pêçî têxista çav, çav nedineqîya. Ji wî ewrên mîna kevirê bazaltê yê reş, pêşî zîpik bariya. Zîpikek wulo ku ya star; her libek mîna gûza Hindê gir. Gurmîn ji konan çû, serê Iraniyan bi zîpikê şikest, leşkeran xwe li ber zîpikê negirt, belav bûn. Mîna têjikên ku diya xwe wunda kiribin vir de wê de bazdan. Gava Keykawûs ev rewş dît, kezeba wî şewutî, zuxurkên xwêdanê di eniya wî re avêt. Wê kêliyê Dêwên Mazenderanê bi ser wan ve girtin. Hin kuştin û hin dîl girtin. Kawûs bi hatina wur, gelekî poşman bû.

Hefteyek buhurî, kesek neduxuya, ne leşker hebûn ne jî aligir. Kawûs şaş ma û tirsiya. Şeva heyştan xuşîn ji ber kon hat, Dêwê Spî ji nişka ve li hember Kawûs mîna reşikê şevê derket: “Ho paşayo!” got bi qêrînî, “ger bi rastî jî Şahê Iranê tu bî, xwelî li serê Iraniyan be! Çawa yekî mîna te ku ji tirsa mîna dara hewrê dilerize şandine vir. Şinge şinga diranên te tê min rebeno! Tu li benda çi bû yî û te çi dît" Qey deşt û zozanên Mazenderanê pêgêle ye ku tu bi simên hespan hûr bikî! Gelek miri^kên birçî mîna te di xewna xwe de garis dîtine! Pişika te nepixî, te gelek qetl û qîtalê dixwest, xwe qurre dikir. Lê belê te hesabê min nekir. Te nav û dengê min nebihîstibû. Tu şukur bike ku bav û kalên me bi Gurçasbê we re peyman çêkirine û gotine em dê bi Iranîyan re neyariyê nekin. Ya na, min dê niha

nefes li te biçikandana û yek pêlewanekî te sax nehiştana. Lê belê niha ez dê we dîl bigrim û bavêjim binê zîndanê. Hetanî taliha we vedibe hûn dê di wur de binalin û bigrîn.”

Duwazdeh hezar dêwê bi şûr û xencer dorhêla leşkeren Iranî girtin û ew xistin zîndanê. Çi malê paqij hebû; ji zîv û zêr, ji aqût û almast hemî ji Padîşahê Mazenderanê Erjeng re birin.

Dêwê Spî berê xwe da qonaxa Erjeng, derket dîwanê û wuha got:

“Êdî tiştekî ji Ehrîmen nexwaze! Min ew li erdê raxist. Şahr îranê û pêlewanên wî ne êdî rûyê tavê dibînin û ne jî yê heyvê. Min Keykawus nekuşt bona qencî û xerabiyê nas bike. Ew dê poşman bibe, lê belê ditirsim ku êdî dereng bimîne.”

Gava Keykawûs dîl girtin, yek ji leşkeren îranî xwe avêt ser zînê hespê û di tarîbana şevê de çargahvî ajot. Dotira rojê ew kes xwe gihand cem Zalê Zêrîn û jê re rewşa îraniyan got: “Feleka xayin li me çep geriya. Tu nizanî çi hat serê me? Tac û textê me li bin piya çû, rûmet û heysiyeta me nema. Hemiyan dîl girtin Qehreman û pêlewan hemî şandin zîndanê û Keykawûs jî bi wan re. Dêw mîna zerzûlan bi ser me ve raweşiyan. Dunya tarî bû. Niha hemî di nava neynokên Ehrîmen de ne. Ger tu kembera xwe girê nedî û bi hawara wan de neçî, dêw xwîna hemiyan vexwun jî têr nabin.”

Zal got “heywax! Mala me xerabû, çira me tefiya, derê me mor bû!” Bi naperûkan rûyê xwe çirand, ax bi serê xwe de kir û kincên xwe pirtî pirtî kir. Bang li Ristem kir:

“Rabe, Ristemê min rabe,

Em dinêrin rewş xerab e,

Hergav bi şox û şengê nabê,

De rabe mêrxasê mala bavê min,

Kawûs dîl girtine em bi eyb û şerm in,

Şûre te di kewdan de zeng girtiye,

Tê çawa derê derve ji heya rû ye?

126

Tan li Ristem ket, gotinên bavé wî ew hêrs kir. Rabû piya, bejn û bala xwe girêda. Zerx û kumzerxê xwe, zirîç û kumzirîç hilanî, gîzma fenerî kişand lingê xwe, gurzê Sam yê ku ji mifriq û pola bû û not movikî lê zêde kiribû da ser milê xwe. Bi heybet li meydanê sekinî û sînga xwe nepixand. Bavê wî pêçiya xwe dirêj kir:

-Xew ji te re êdî heram e. Sekin jî nîn e. Ka bêje; kesê ku pozê rima te dîtiye hetanî îroj xelas bûye? Erjeng û Dêwê Spî gava çav bi te bikevin, çokên wan dê sist bibe. Sînga wan biperitîne, hûr û rodiyên wan birijîne! Bila derbên xweşmêran li ber çavê xwe bibînin. Zanibin goştê her çûkî nayê xwarin!

Ristem:

-Bavo! Te kezeba min peritand, dilê min kir sotikê êgir. Riya Mazenderanê riyek dûr û dirêj e. ez dê çawa herim, ji min re bêje.

-Du rê hene; lê belê her du rê jî gelekî bi xetere û astengî ne. Yek pir dirêj e, ya din kin e. Riya dirêj digihîje zîndana ku Keykawûs tê de dîl e. Lê belê ya kurt du hefte dajo bi piyê hespê. Li ser wê gelek şêr û dêw hene, riyek tarî ye. Ber çavê te wê reş û tarî bibe. Lawo, tu ji mala egît û fêrisan î. Kalê xwe Sam di bîr bîne. Metirse, di vê rêyê de here. Hespê bin te jêhatî ye. Bona ez careke din bejn û bala te bibînim, ez dê hetanî berbanga sibehê dua bikim. Mêrxasekî mîna te ger ji mirinê bitirse, ev gelekî eyb e.

Ristem kûr ponijî, dû re wuha got:

-Heta niha ez ji gotina te derneketim. Niha jî fermana te re amade me. Ez dê sêhra wan pîrebok û ecinîyan xera bikim. Çiqas pêlewanên Iranî hebin, ez dê wan bicivînim û birêkim. Ez dê ne Dêwê Spî bihêlim ne jî Erjeng! Ez sond dixwum bi

Xwedayê şev û rojan, hetanî Erjeng hêsîr negrim, dest û piyên wî girê nedim û sitûyê wî li qeydê nexim, ez ji ser pişta Rexş danakevim xwarê.

Hespê kihêl rabû ser du piya, firnikê pozê wî mîna qirika marê qobra fireh bû. Ew gav Rûdabe ji hundur derket û giriya:

-Niha ez çi bêjim, li te tesîr nake. Tu min di nava elem û axînê de dihêlî û diçî!

Ristem dest danî ser milê diya xwe:

-Ez bi xwesteka dilê xwe naçim dayê! Li eniya min wusa nivisî ye, ez çawa bikim?

Ristemê Zal, ji welatê Nîvrojê di bin ezmanekî şîn, rojeke vekirî de veqetiya. Hesp xweş ajot, hîç nelukumî û ranewesta, riya ku du roj diajot, (şev jî lê bû roj) wî di rojekê de li dû xwe hişt. Çend roj bi şûn de fire fir ji pozê Rexş hat û rawestiya û birçî bû. Li deştek fireh, li ser mêrgekê rawestiyan û bêhn berdan. Gakûvî di wê berriyê de gelek bûn. Ristem yek ji wan bi xavê kemendê zeft kir û serê wî jê kir, qirş û pûş û êzing civand. Tîr avêt tatê bi çirûska tîrê pûşê hişk vêket, agir alav da. Gakûvî pijand û bi goştê wî zikê xwe têr kir. Serê hesp ji dizgînê vekir û ew berra ser mêrgê da. Rexş li dorhêlê tor tor geriya û çêriya. Ristem jî xwe berra nav zil û qamîşan da û di qoziyekê de xwe dirêj kir û niviya. Xewa sê şev û sê rojan ketibû çavê wî. Şûr xistibû bin serê xwe, haya wî ji bayê felekê tunebû. Nizanîbû cîhê ku lê razaye lana şêr e! ew di xewa şêrîn û kûr de, şêr vegeriya lana xwe. Dît ku mirovekî di qelafetê fîl de wulo gir û zexm di

lanê de dinive û hespê wî jî li deştê diçêre. Cesaret nekir ku pêşî ên^î zilam bike, berê xwe da caniyê belek. Gava Rexş şêr dît, ji cîh hilqevizî û her du piyên pêş avêt ser serê wî, diranê xwe di pişta wî de bir xwarê. Orîn ji şêr çû û ket

erdê, li ser mêrgê gevizî. Ji dengê wî, Ristem şiyar bû û dît ku şdr li erdê dipirpite. Bi Rexş re hêrs bû:

“Kî ji te re got şêran bukuje? Şêrê reben çi kiribû ji te? Tu çi hespekî bêhawe yî? Ger şêr te seqet bikirana, ev gurz û mertala giran wê kî hilgirtana? Kî wê zerxê ji çermê bebir bibirana hetanî Mazenderanê? Gava şêr ên^î te kir, divê tu bihatana cem min û ez şiyar bikirama.”

Dîsa serî xiste xewê. Hetanî roj bi nazenînî serê xwe ji pişt çiyayên poztûj derxist, ew nivîyayî ma. Dema şîyar bû, ewul caniyê xwe şeh kir, mûyên wî paqij kir û zîn da ser piştê. Derket rê; çol û çolistan, berî û beristan çû. Li pêş wî riyek derket, serê hespê bi wur ve zîvirand. Bala xwe dayê ku erd terikî ye û ax dikele, celx tê de vebûne. Germaya axê rûyê wî alast. Xwêdan da, pişika wî zuwa bû. Nihêrî ku rehekên ser axê jî ji germê hişk bûne. Ew gav çend teyr di ser sera re firiyan, lê belê li hewa hişk bûn û serserkî hatin xwarê. Bayê deştê jî mîna alava êgir bû û çermê mirov dişewutand. Kêlîyekê hesp ajot, lê belê her diçû erd bêhtir disincirî, germ zêde dibû. Tî bû, zimanê wî bi ezmanê devê wî ve zeliqî. Rexşê Belek jî bê mecal ket. Hesp rawesta û ew jê daket xwar, rahişt tîr û kevanê û bi çolê de bazda. Bi ku ve direviya? Bo çi? Wî jî nizanibû. Tu çare nedît; çok da erdê, dest vekir û berê xwe da jor: “Ya Xwedayê şev û rojan! Divê ez Kawûs xelas bikim. Dilê Zalê Zêrîn bi derdê min dax neke!” Kevirên

goristanê hat pêş çavên wî. Zarotiya wî, ceng, dilşahî û heval hemî hatin, yek bi yek di nav ewran re buhurîn. “Ez çi bikim? Ez ku Ristemê Zalê bim, çawa têkevim vî halî! Ez dikarim bi gurzê xwe çiya hilweşînim, lê belê çara bêaviyê nîn e. Mirin gahv bi gahv nêzîkî min dibe. Lê ez bêçare li benda wê me...” Axifî, bi ser kul û derdên xwe ve kelegirî bû, hetanî li ser pişt ket, ji tîna pişika wî zuwa bû. Lê belê hişê xwe wunda

130

nekir. Ew gav dît ku mêşinek di ber wî re buhurî û marîya. Mare mara wê bihîst. Got ev xewn e. Dîsa jî serê şûr di axê de çikand û bi alîkariya şûr rabû piya. “Cîhê ku pez lê hebe, av jî heye! Pez hebe, av jî heye. Av jî heye.” dubare kir û li pey mêşinê çû. Di destekî de şûre tazî, mêşin li pêş çû û ew jî li dû meşiya. Ji dûr ve kaniyek dît; mêşin bazda ser ava kaniyê. Ristem keniya, li dora kaniyê geriya, şopa simên heywên tunebû. Xwe dirêj kir û lîç li avê bû. Dû re pişta mîhê mizda û jê hez kir. Bazda cem Rexş, zînê wî vekir û ew şûşt û hênik kir. Pirça wî ya belek biriqand, bi avê têr kir. Rahişt tîr û kevanê û ket nava da’lê. Ji newalekê pezkûvîyek reviya, çindik da xwe û jê dûr ket. Lê belê kurê Zal tîrek li pey şand, ew gêndirî erdê kir. Ew gurand û goşt pijand û li qeraxa kaniyê rûnişt, têr xwar. Piştre di aramiyê de, di nava bêhna xwezayê de û di bêdengiya şevê de nivîya. Rexş jî li deştê giya qurmuçand, zikê xwe têr kir.

Pêşiya gotibû “xew û mirin yek e”, di kûraniya xewê de ejderhayek ji nava daristanekê derket. Heywanetek gir û wahşî bû. Serê wî biçûk, lê gewde mezin bû. Dûvika wî kin û stûr bû û di pişta wî de hetanî serê dûvê quloç hebûn. Gava êri^î Rexş kir, ew ber bi xwediyê xwe bazda, bi simên xwe pêkolîn kir û erd veda, hîre hîrek jê çû ku dunya lerizî. Ristem şîyar bû û tavilê rahişt şûr, xwe gihand cem hespê, lê belê tutişt nedît. Vir de çû, wê de hat, geriya. Cenawur wunda bûbû. Bi Rexş re hêrs bû: “Tu nahêlî çavên

min herin ser hev!” Hêja xirmaşê xewê bû, ew ejderha cardin hat û canîyê belek dîsa geremoziya kir, serî hejand û kir fire fir. Dû re erd kola û tozê li dûmanê xist. Xwedî dîsa şiyar bû, kete tatêlê û xeterê. Li çar alî qenc nihêrî, guhê xwe da dengê şevê. Ji bilî dengê çirçirkan û xuşîna bayekî sivik tutişt nebihîst. “Tu çi dixwazî hey heywanê hêç? Tu xeyalan dibînî, reşayî tên ber çavê te, tu min şiyar dikî! Tu dawa

îmana min diki hey hespê nalet! Ger tu carek din min bê sebeb şiyar bikî, ez dê serê te bi vî şûrî jêkim. Ez dê hetanî Mazenderanê peyatî herim û gurz û kemend, tîr û kevan, zerx û meratala xwe hilbigrim.”

Cardin niviya. Ejderha dîsa hat û sewtek wulo derxist ku guh kher dikir. Axa bin Ristem hejiya. Ji ber hulma wî dunya germ bû. Firnikên pozê wî alav davêt. Rexş li dûr bû; vêcarê nehat cem xwediyê xwe û ji ejderha jî reviya. Him ji Ristem tirsiya û him ji ejderha. Ristem şiyar bû û vêcarê ejderha dît. Şûr kişand û êri^ kir. “Ya ejderhayê xerîb! Tu min nas nakî, lê tu dê niha bicehimî!” Ew gav Xwedê ziman avêt devê ejderha: “Kesek ji pencên min nafilite. Ev çol di bin fermana min de ye. Erd ezmanê vir jî ji min tê pirsîn. Bê destûra min teyr jî nikarin bifirin. Bêje tu kî yî?”

“Ez im neviyê Teyra Sîmir, kurê Zalê kal. Ordîyan belav dikim, pêlewanan radixim li erdê.”

Ejderha ji nişka ve êri^ kir. Dûxan rabû, erd hejiya. Ristem şewuşî ser axê, lerizî û hindik ma ku goştê canê wî wesle wesle bibe. Rexş nihêrî ku rewş xerab e; guhên xwe mûç kir, serê xwe qûç kir, dûva xwe rep kir û beziya. Hat, diranên xwe di pişta ejderha re kir, cêtîyek goşt jê anî xwarê. Xwîn pijiqî. Bi vê fersendê re, Ristem jî şûr kişand û serê cenawur pekand. Dû re çû ser kaniyê, dest û rûyê xwe şûşt, pûrta Rexş tîmar kir, zîn danî ser pişt. Nesekinî, ket ser rê. Ew rê, weke ku Zal jê re gotibû, ya pîrebokan bû. Hesp bi çargahvî ajot. Dotira rojê, gava tava zer pelên dara biriqand, cîhekî pir xweş derket li pêşiya wî. Her alî şîn bû, gul û sosin her alî

xemilandibûn. Li çar alî dar û devî hebûn. Çîk çîka çivîkan, dengê şalûr û bilbilan û şire şira avê dihat. Kaniyek di navenda mêrgê de diherikî. Ava wê zelal bû û mîna çirra şîr jî paqij. Li qeraxa kaniyê

132

stekanek zêrîn dibiriqî ku tijî şeraba xurmê bû. Sifra xwarinê li erdê bû û goştê berxan yê sorkirî amade bû. Dendik û bindeq, bihîv û fisteq jî li alî din bûn.

Li sifrê nihêrî û xwe ji ser hesp pengizand xwarê. Ji wê sifrê ket şikê. Ew xwarin ya pîrebokan bû. Gava ji dûr ve kurê Zal dîtibûn, tirsiyabûn û reviyabûn. Çû li nava daalê rûnişt, stekana şerabê hilanî. Tembûr bi darê ve hilawestî bû. Rahiştê û bi ser kul û derdan ve sitranekê got:

“Ez Ristemê Zal, bê talih û siûd im, bê reng û rû Eware digerim, rojek li min xweş derbas nebû,

Min xêr ji ciwaniyê nedît, hêlîna min qet çê nebû,

Di şer û cengê de, cîh-warê min tim çol û çiya bû.

Feleka xayin ji mey û neyê, ji gul û reyhanan,

Mehrûm hişt, min derd kişand bi dem û dewranan...”

Gava tenbûra wî dengveda û sewta wî ket çiya û newalan, pîrebokan bihîst. Yek ji wan rabû, xwe xemiland, kincên ba^ş li xwe kir, bêhnên xweş di canê xwe da û çû cem Ristem. Li rex wî rawesta û li hal û wextê wî pirsî. Kêfa Ristem jê re hat: li wê çola tenha, li bin wî ezmanê bê sitûn, keçika xweşik, şerab û tenbûr, xwarina xweş. U dîsa sermestî. Sitekanek tijî mey kir û da keçikê. Keçik mey ji destê wî venexwar. Lewma Ristem ket şikê. Derhal kemend avêt sitûyê wê, got “bêje tu kî yî, zûka xwe eşkere bike!” Rû û made li keçikê guherî, gepên wê reş bûn, şîn bûn û dev û lêvên wê

zuwa bûn. Piştre rûyê wê jî qermiçî û çermê canê wê daleqiya; bû mîna pîra heftê salî. Ristem fam kir ku ew pîrebok e. Xencera xerzanî ji ber xwe deranî û li ser dilê wê xist.

Suwarê Rexşâ Belek ji wur rabû, dîsa teng û bertenga zîn, şirik û gulik, gem û mînder pê ve şidand û ajot. Piştî wî, pîrebok hatin ser meytê hevala xwe. Derba Ristem bi çavê serê xwe dîtin û sawa wî ket dilê wan. Çend saet bi şûn de roj çû ava, tarîbana xwezayê dîsa bû hakimê dunê. Ristem xwe gihand welatekî xerîb. Zilûmat nedihişt ew bilive. Ne heyv hebû, ne stêrik hebûn. Tarî teniya bin beroşê bû, diket çavên wî! Ne dem dibuhurî, ne sibeh dihat û ne jî stêrik diavêtin. Wî rê şaş kir. Çiya û devî dor lê pêçan, rojhilat û rojava, başûr û bakur lê guherîn. Pişt bû pêş, çep jî bû rast! Tu rê nedît, bê çare ma. Hema dizgîna hespê serbest berda. Hesp meşiya, kêlîkê bi şûn de ji tarîyê xelas bû, Rexş derket nava zeviyên hêşîn, roj bişirî, ronahîyê erdê spî kir. Xwêdan dabû, kincên wî şil bûbûn. Betilî bû û ji hayho ketibû. Xwest hinekî raweste. Zerxê ji çermê bebirê deranî, dû re kumzirîçê xwe avêt, zîn û gema Rexş vekir ew berra nav zeviyê da û xwe li ser mêrgê dirêj kir. Piştî ku kinc zuwa bûn, wî ew li xwe kir, ji gîyayê balîf çêkir, xist bin serê xwe û raza. Demek kurt buhurî, notirvanê zeviyê hat, hesp di nav zeviyê de dît. Bang kir: “Kî ev hesp berra nav zevîya min daye?” Kesekî bersiv neda. Çavê xwe gerand; Ristem li ser mergê dirêjkirî dît. “Ho rêwîyo! Lawo ev der palava te û bavê te ye?” Deng jê nehat dîsa. Hema lezand cem û ew hêja di xewê de, dar li bin piyên wî xist. Ristem veciniqî, xirmaşê xewê bû, lewma tiştekî ji rewşê fam nekir. Nobedarê zevîyê domand: “Hey zindiq! Te ev ax bê xwedî dît ne wulo? Ne eyb û fediye zerar û zîyana xelkê dikî?"

Ristem deng nekir, hema ji hindav de rabû û rahişt guhê wî. Ew axifî û Ristem jî guhê wî şidand, hetanî guhê wî jêkir. Rebeno çav bi xwînê ket,

giriya, hewar û gazî kir, lê belê kesek di hewara wî de nehat. Bê çare ma, rahişt guhê jêkirî û reviya.

134

Di wî welatî de bi navê Ûlad pêlewanek hebû. Xweşmêrekî bi nav û deng bû. Notirvanê zevîyan tevî guhê jêkirî û sitûyê xwe yê bi xwîn çû qesra Ûlad. “Belayek hat serê min ya mîrê min!” got. “Min zilamek di nav zeviyan de dît. Zerxek lê hebû ji çermê bebir, kolosek li sera bû ji hesin. Bejna wî mîna spîndarê dirêj bû. Dabetulerdek bû, an jî ejderhayek ez nizanim. Dibe ku şey^n be jî. Ez çûm cem. Min dar li bin piyên wî xist. Lê belê, tu dibînî, wî guhê min jê kir. Dû re dîsa niviya.” Kufe kuf bi devê Ûlad ket, rabû piya. “Mêrê biyanî li bela xwe digere? Çi heqqê wî heye zeviya me diçêrîne?” Pêlewan û leşkeran li hev civand, çek û xêbet hilanî û da ser rêça Ristem. Dotira rojê, Ûlad û zilamên wî, li çiyayekî asê xwe gihandin Ristem. Dema kurê Zal ew dît, bazda û bi lez piyê xwe xist rikêba zînê Rexş. Her du pêlewan gava hatin hember hev, Ûlad pirsî: “Tu çi ji me dixwazî, bo çi zeviyê me diçêrînî? Çi karê te li welatê dêwan heye? Te guhê notirvanê me jêkir; tu li hember kesên reben û belengaz şêr î?” Ristem lê vegerand:

“Te di temenê xwe de ewrê zîpikê dîtiye gelo? Ez ew im û rim û şûr û tîran dibarînim. Seriyan digindirînim ser axê. Ger ez navê xwe bêjim, xwîna dilê te wê bisekine. Ez Ristemê Zal im. Sibehê, diya te ya reben wê kefenê te bibire û şî^ bigre!”

Şûre xwe yê ji xwînê re tîbûyî ji kewdan kişand, kemendê bi zîn ve girêda û gurz hilanî, ajot navenda leşkeran. Ji berevkê ve, kî ket ber, bi ket û birr şûr hejand. Pêlewanên Ûlad bûn mîna pezên guraxwarî; her yek li cîhekî ket. Hin ji wan bê serî li erdê perpitîn, hin ji wan bi ser birînên xwe de

naliyan. Yên ku sax filitîn jî reviyan, berê xwe dan çiyayan. Ûlad tenê li navenda şer ma. Ristem serê xavê kemendê kir girênîvik û avêt serê wî. Ben ket qirika Ûlad. Ristem ew kaş kir û ji ser hespê anî

xwarê. Ji Rexş daket û çû li ser sînga wî rûnişt. Dest û piyê wî girêda û jê re wuha got:

-Ger tu cîhê Dêwê Spî, Gundî û kurê wî Polad, cîhê Bîd ji min re bêjî, zîndana ku Keykawûs niha tê de dîl e nîşanî min bidî û pirsên ku ez ji te bikim tu rast bibersivînî, ez niha te nakujim. Ger tu alîkariya min bikî jî, dema ez tac û textê Mazenderanê bidestxînim, ez dê paytexta vî welatî teslîmî te bikim. Ji riya qencî û rastiyê derneyê bes e. Lê belê ger tu derewan bikî û min bixapînî, ez dê çavê te birêjim û sitûyê te jî bişkênim.

Ûlad di bin de hêdîka got:

-Ka ewul dilê xwe safî bike! Rik û xereza nava xwe bavêje! Jixwe tiştekî bê çareser namîne. Tu ruhê min nestîne, ez dê pirsên te yeko yeko bibersivînim. Ez zîndana ku Keykawûs tê de ye dizanim. Ger baweriya min bi te were ku tu dê min nekujî, ez dê cîhê Dêwê Spî û Bîd jî nîşanî te bidim.

-Ez li ser soz û qerara xwe me.

Ûlad:

-Ê, baş e. Binêr, cîhê ku Kawûs lê hefskirî ye sed fersah ji vir dûr e. Riyek ji wur digihîja mala Dêwê Spî. Heta wur jî rê sed fersah dajo. Lê belê temeniya min li te, divê tu gelekî bi ba^ş li rê biçî. Çimkî ew rê li ser pişta çiyayekî tûj de dibuhure. Mala Dêwê Spî di nava du çiyayan da ye. Cîhekî wula bêkeys de ye ku rawur û teyr û turûd jî xwe nagihînin wur. Di gelî de sed bîrên gelekî kûr hene. Şahê we di binê wan bîran de dîl e. Lê belê di kîjan bîrê de ye, bi Xwedê ez jî nizanim. Duwazdeh hezar dêwên şervan ji bona Kawûs nobedar in. Serokên wan Bîd û Sence ne. Navê fermandarê

mezin jî Gundî ye. Lê belê Dêwê Spî serokê hemiyan e. Ew yekî gelekî gir û şerûd e, çiya jî jê ditirsin. Jixwe bejna wî mîna çiya ye; nav

136

milên wî, sînga wî û çepilên wî her yek qasî kemendek fireh û dirêj in. Tu bi van zend û bendê xwe, bi şûre tûj, bi gurzê risas û digel rima xwe jî li hember wî derneyê. Bo te nebaş e. Piştî ku tu ji wur derbas bûyî, zinarek dê derkeve pêşiya te û dû re jî çolek. Di wê deştê de ask jî nikarin bibuhurin. Tê bêjî çima" Riya wur ne baş e û cenawurên wur gelek in. Piştî ku te çol derbas kir, çemekî ku firehiya wî du sed fersah e wê riya te bibirre. Dêwekî li ber çem heye, navê wî Xunereng e. Yên din di bin fermana wî de ne. Piştre tu dê qesrek gelekî dirêj, bilind û fireh bibînî; navê wê min ji bîr kir. Çi bû" Çi bû" Buzgûş bû, belê belê Buzgûş. Dêwê Nermpa li wur e. Riya ku ji wur diçe Mazenderanê gelekî dûr û dirêj e, tewer xelesemt e jî. Bi hezaran suwariyên wî welatî hene. Hemî jî bi çek in û çeleng in. hezar û du sed jî fîl xwedî dikin. Lê tu" Pêlewano lo, tu yek mirovekî! Ger tu ji kevir bî jî, tu dê çawa xwe têxî bin birreka Ehrîmen"

Ristem keniya û kurt axifî:

-Ger tu bi min re werî, tu dê li ber çavê xwe bibînî da ez çi hukmî dikim. Tê bibî şahid, ez dê wan dêwên bi nav û deng çawa li erdê raxim, axa wur bikim gola xwînê. Gava hêz û qeweta zend û bend û masûlkên min bibînin, sosreta gurzê min fam bikin, ji tirsa wê piyên wan ji erdê bê birrîn û çermê wan wê biçirre. Ne dizgîn wê bibînin, ne zengû. Axaftina dirêj min navê. De rabe ser xwe û bide pêşiya min, cîhê Keykawûs nîşanî min bide!

Xwe bi coş avêt ser pişta Rexş û Ûlad jî da dû.

Negotin ev şev e, negotin ev roj e, nenihêrîn li ronahî û tariyê, ranewestan bi berf û baranê, zîpik û tofan jî li wan tesîr nekir, çûn. Çiya bi çiya, newal û newal, deşt û zozan çûn, gehîştin çiyayê Espîrozê. Ristem rast li dêw û pîrebokan hat; heta nîvşevkî dengê def û borîyên wan dihat. Ji dûr ve li çar

aliyê Mazenderanê alava êgir dixuya, di tariyê de mîna zêr dibiriqî. Ristem ji yê li rex xwe pirsî:

-Ew cîhê ku wuha bi êgir e, ku der e gelo.

Ûlad got:

-Deriyê bajarê Mazenderanê ye. Dêwê wur gelek in û ji sê payan yek ranazên, notirvaniyê dikin. Polad, Erjeng û Bîd di nava wan de ne. Ka baş bala xwe bidê; wa ye darek gelekî bilind dixuye, serî digihîje ewran û stêrik li dora pozê wê civîyane. Cîhê Erjeng li rex wê darê ye.

Ristem pê bawer kir. Lê belê dem dema xewê bû. Ûlad bi kemendê girêda û serî xist xewê. Hetanî roja sibehê rûyê xwe yê sor û zer deranî, ew raza. Piştî şiyar bû, gurzê kalê xwe bi zînê hespê ve girêda, haletên herbê hilanî û ket rê. Qederê demekê çû, hetanî xwe gihand nav wan dêwan, cîhê êgir. Gava gihîşt wur, digel betilî bû jî, dîsa serê Rexş ber bi cîhê Erjeng ve zîvirand û dengê halana wî di nava wan çiyayan de olan da: “Heyho! Heyho! Ez kî me lo? Ez im Ristemê Zal, şêrê Qela Zabilê, şervanê Çiyayê Elburzê! Qey wê heyfa Kawûsê Keyanî ji we re bimîne lo? Hûn dê bi ku ve birevin?”

Çiya meşiyan, xuşîn ji dar û deviyan çû. Ji ber sewta dengê wî kêliya hemî teyr ji hêlînên xwe firîyan, Erjeng jî ji bin çadira xwe derket. Ew li ber kon, kurê Zal, suwarê Rexşê Belek ji cîh hilqevizî û şûr avêt serê wî. Erjeng hêja rewşê fam nekiribû, bi yek derbekê re serê wî pekiya. Ristem rahişt serê bê laş yê bixwîn, bi por girt, li hewa carek ducar hejand, bi destê çepê

avêt bi yê rastê zeft kir û bi qêrîn heliqand nava dêwan. Dêw terişîn, ji hev belav bûn. Hêza masûlkên wî li ber çavê xwe dîtibûn. Serê Erjeng yê jêkirî qudûm bi wan ve nehişt, xof xist nava hemiyan. Cîh û war, erz û eyal, mal û xêbet hemî ji bîr kirin û ketin ta'têla canê xwe. Ristem bi nav wan ket, şûr

138

hejand, tîr avêt, rim çikand û kemend pengizand. Bi dengê zarîna dê û bavan, nalîna birîndaran dê weledê xwe davêt. Bira nediçû ser termê bira. Extiyar û jin li bin dest û piyan çûn. Hetanî roj çû ava, Ristem di nava wan de cengê domand û seriyan gêndirî ser axê kir. dema lemba dunê serê xwe di pişt çiyayan de veşart, kurê Zal rawestiya, helke helk bi ser ket û xwêdan da. Serê xwe rakir, bi dilekî xemsar li raserî xwe mêyzand, li çiyayê Espîrozê nihêrî. "Hey Espîroz! Bê bext! Tu ne mîna navê xwe pîroz î! Te Şalhî me hêsîr girt." Dû re Ûlad girt cem xwe û her du çûn bin darê rûniştin. Careke din ji Ûlad cîhê Kawûs pirsî. Wî dîsa got "di bîrê de ye." Rabûn û di nava bîran de geriyan. Ji nişka ve hîrîna hespê hat. Hîrînek wulo ku mîna dengê şîrqîna brûskê. Rexş Belek bû ev. Dengê wî çû guhê Keykawûsê di bin bîrê de hêsîr. Dengê Rexş nas kir û mizgîn da dîlên din yên Iranî: "Rabin, rabin! Rojên tarî xelas bûn. Canê min bi dengê Rexş teze bû. Bedena min zîl da! Rexş di rojên girîng de dihîre. Tê bîhra min, gava Keykûbad êrî^ bir ser padîşahê Tirk, ew gav jî hîriyabû."

Yek ji girtiyan bersiva wî da: "De here lo! Te di zîndanê de eql avêtiye. Tu li ku û RHXŞÎ belek li ku? Ben û qeydan hiş ji serê te biriye. Xewn û xeyalên zîndanê xweşin!" Ew gav Ristemê Zal serî di wan re derxist. Qehremanê Qelafetfîl nêzîk li Keykawûs kir. Nihêrî ku Guhderz û kurê wî Gîw, Gustehem û Sîdûş û digel Behramê Hêç jî li wur dîl in. Dilê Ristem bi rewşa Kawûs, bi kincên wî yên qetiyayî û gemarî, bi riha wî ya dirêj şewutî û

êşiya. Şah jê re wuha got: “Rexş nehîriyana te cîhê min nedidît. Ger Dêwê Spî bibihîze ku te Erjeng kuştiye, ew dê hemî dêwan li ser serê me bicivîne. Ew gav hemî keda te wê bi avê ve here. Berê xwe bide qesra Dêwê Spî. Lê belê li pêşiya te heft çiya hene û hemî tijî dêw in, ew kom bi kom digerin. Piştre

tu dé leq li şikeftekd wen. Li gor gotinên gotinbêjan ew der cîhekî bi xof û saw e. Qesra Déwé Spî mixare ye û dew riya wur diparêzin. Ez ditirsim ku gelo tu dé pé karibî an na. Hay ji xwe hebe.

Di dîlgirtina me de dijmin pir tade û zoré li me kir. Çavén me kor kirin. Niha ez te nabînim, tené dengé te dibihîzim. Zana û hekîmén ku niha li cem me dîl in, dibéjin ku méjiyé Déwé Spî dermané korbûna me ye. Ger em di çavén xwe bidin, wé rihet bibin. Bijîjkek jî dibéje sé niqutén xwîna dilé Déwé Spî besî rihetkirina çav e.”

Dem ne dema gotin û galgalé bû. Déwan xwe ji cengé re amade dikir. Ristem berî ku xatir ji wan bixwaze wuha got: “Ez va ye diçim şere Déwé Spî. Hûn jî şîyar bin. Ew déwé cengé ye û gelekî çeleng jî li dora wî hene. Ger ew zor bide min û ez bisernekevim, hûn dé bi salan di zîndané de bimînin. Ya na, heke Xwedané şev û rojan alîkaré min be û felek li pişta min be, em dé bigihîjin welaté xwe, Tac û texté me, qesr û qonaxén me wé bé Şah nemîne. Dara pederçahiyé wé dîsa fékî bide!” Hemî dîlan bi hev re li pey wî dua kirin:

“Bila hesp û gurzé te, şûr û zîné bin te bé xwedî nemîne!”

8.

Şere Ristemé Zal û Déwé Spî şerekî pir bi nav û deng e. Di dîroka Mala Zalé de piştî şere Laab û Ab û Neynokdiréj, piştî cenga çiyayé Elburzé, ev şer cîhekî girîng digre û ba^ş e.

Ji bona Malbata Keyaniyan û texté pederçahiyé piştî vî şerî dîrok ji nuh ve té nivîsîn.

Ristemé Zal kembera zérîn li nava xwe péça, çek û haletén herbé hilanî; xavé kemendé, mertala pola, zerxé ji çermé bebir, zirîç û kumzirîç li xwe kir û zîné Rexş li ser piştê şidand. Ûlad bi xwe re bir û çû, toz û dûman li pey xwe hişt. Hespé kihél geh bi telebé beziya, geh bi loqé û geh bi rehwanî. Xwe berra nava wan heft çiyayan da. Alavén égirén ser çiyayan şeva tarî belav dikir. Komén déwan li dor terrafa wan égiran mijûl dibûn, kéf û henek dikirin, haya wan ji bayé feleké tune bû. Kuré Zal raste rast ajot ber deré şikefta Déwé Spî, nihérî ku çi bibîne! Malik mîrat be; ne serî heye ne binî!... Déw jî dor lé girtina, nahélin mêş jî bifire hundur. Ji Ûladé li rex xwe pirsî:

-Gotinén te heta niha rast derket in. Riya ku te nîşanî min da jî rast derket. icar dor hat kuştina Déwé Spî. Wextê éri^é hat. Ka bêje ré di ku de ye. Sirrên vir çi ne?

Ûlad:

-Ez riya rastiyé bernadim. Piştre... Piştre jî tu û wujdanê xwe. Tu min dihélî jî û dikujî jî tu dizanî. Her mexlûqatek xwey kémasî ye. Gav û saetén jar hene ji hemîkesî re; Déwé Spî jî dema tava nîvro tûj dibe, xewa wî té, mitleq dinive. Kéliya ew xirmaş bû, tu êri^ bibe ser. Ger tu ew gav bisernekevî, tu nema karî bi wî. Niha sebr û sebat ji te re divé. Hinekî bisekine. Her tişt bi béhna fireh, hédî hêdî... Ji bilî çend pîrebokén nobedar, hemî déw wé razén.

Ristem li benda bilindbûna rojê dipa. Gava roj di navenda ezmané bé sitûn de li ser firavîné rûnişt û agiré xwe reşand ser duné, qêreqija navrojê gul û sosinan qermiçand. Mar ji qulan derketin, kûsî û jojiyan serî

ji qalik dirêj kirin, çirçirkan li nava zeviyan gazî hev kirin, zebeşê kal cîhé dendiké xwe sor kirin,

wî carek din dest û piyên Ûlad girêda. Li hespê belek mina carê caran suwar bû. Bejna wî bû çiya, serî gihîşt ewran, şûrr tûj û khêrî ji kewdan kişand li ber rojê biriqand. Wext hatibû. Wexta man û nemanê. Bi coş û heyecan nav di xwe da: “Lo ez kî me lo! Ez im neviyê Samê Nerîman, qehremanê çiyayê Sîpendê, pêlewanê ku serê Ab jêkir. We Şahê Iranê dîl girtiye; ma hûn me çi dihesibênin lo! Heke ev yek ji we re bimîne, bila şîre Geveşîna diya Emermadîn li min heram be! Hûn dê niha şillT tazî di bedena xwe de bibînin!” Xwe mîna ecacokê berra nav koma dêwan da û xwîn herikand kir mîna lehiyê. Wê axê bi xwînê hine kir. Kesek li hember wî nema. Yên mayî jî ji bizav ketin. Nihêrî ku tukes serî ranekir, vêca mîna bablîsoka ji êgir ber bi alî cîhê Dêwê Spî ve pekîya. Çû wur, nihêrî ku şikeft e. Şikeftek tarî ye, mîna dojehê ye, bêhna mirinê jê tê. Bîstkê li wur rawesta, çav û bijangên xwe paqij kir. Çavê xwe ji tariyê re elimand û li kûraniya mixarê nihêrî. Li paşiyê, cenawurek ku pirça wî di rengê moriyê de bû mexel hatibû û razabû. Ji xire xira wî, dîwarên şikede dihejiya. Ristem bi dengê piling qêrînek wulo derxist ku, dêw veciniqî û ji cîh hilqevizî, serê wî li qatiyê şikefT ket. Tavilê xwe avêt ser Ristem. Zend û bendên wî, kum û kolosên wî ji hesin bûn. Rahişt ferê destarekî û TİİŞ kir. Mîna çiyayekî reş dixuya mîrato. Ristem ew gav tirsiya û ket xeterê, cara yekemîn bû ku ji dijminê xwe fikaran dikir. Sekinî û fikirî. Tirs, eyb û şerm bû ji wî re; hema cesaret da xwe û weke ŞTUHM bêhawe xwe çeng kir dîsa. Derba PTŞÎ neda neyar, wî li dêw xist. Şûr di nava PİŞWT de bir xwarê. Orîn ji Dêwê Spî çû. Cara duemîn vêcarê şûr li alî çepê hejand. Lingek û destek dêw jêkir. Xwîn pijiqî rûyê wî. Ew li benda ketina wî ma, lê nafîle!

Dêwê Spî neket; mîna marekî birîndar xwe kir xelek û hêza xwe civand, cardin xwe gihand Ristem û pê ve zeliqî. Her

142

du mîna fîlekî hêç û ŞTUHM devbixwîn çûn û hatin, di nava mixarê de zîzikîn. Bi hev ve gevizîn, helke helka wan ji dervayê şikede jî dihat bihîstin. Dêwê Spî li ser lingek mabû, êrî^ dikir û diberxwe dida. Milên wî li dîwaran û serê wî li qatiyê şikede diket. Ji her duyan jî weslên goşt dihat xwarê. Di xwîna hev û din de digemirîn. Li gola xwînê dişemitîn û mîna neynikê şikK xwe tê de didîtin. Ristem di dilê xwe de wuha got: “Ger ez îroj canê xwe ji destê vî bêbavî xelas bikim, ez dê bawer bikim ku êdî mirin ji min ra nîn e!” Eşa birînên Dêwê Spî her diçû zêde dibû û hêviya wî gav bi gav kêm dibû: “Piştî ku destekî û lingekî min jêbû, ger ez karibim xwe ji destê vî ejderî xelas bikim, êdî ez li van deveran namînim. Divê kesek rûyê min nebîne. Ez dê birevim û herim.”

Li hev xistin bi şûran!

Li hev xistin bi gurzan!

Haho! Haho! Şere egît û mêrxasan!

Xavê kemendê avêtin hev,

Xwîn û kêm herikî ji dêw!

Gurme gurm ket mixarê,

Li hev xistin heta êvarê,

Xwêdan wek lehiya buharê,

Dêw û leheng bi qare warê,

Hemî kher bûn ji dengê kurê Zalê.

Ristem bi pencên xwe yên tûj û bihêz Dêw zeft kir û ew bilind kir, li erdê xist. Ev peşreva dawî bû; Dêw hîç nelibitî. Kurê Zal şaş ma. Wî bawer nedikir ku wê wuha zûka bimre. Ew gav xencera Xerzanî ji ber xwe deranî, sînga wî çirand, dilê wî yê reş jê hilanî.

Dêwên din, pıştî kuştina serokê xwe tirsiyan û hemî reviyan. Kesek li hember Ristem derneket. Ristem meşiya der; kembera xwe vekir, zerx û kumzerxê xwe deranî, ser û sincê xwe ji xwîna dêw şûşt. Piştre vegeriya cem Ûladê dîl, ew ji qeyd û ben vekir, kemenda xwe bi zînê Rexş ve girêda. Dilê Dêwê Spî da destê Ûlad, xwest ku berê xwe bide cem Keykawûs. Lê belê berî ku têkeve rê, Ûlad jê re wuha got: “Mîrê min! Tu şêrê Iranê yî. Tu zanibî ku gerdûn ji şûra te re serî tewandiye. Lê gelo çima hêja jî ben û qeyda te cîh di canê min de çêdike? Te soz dabû min ku piştî kuştina Dêwê Spî tu dê min azad berdî. Ka ad û waada te? Li Mazenderanê kesek nema ku li dijî te rabe. Tukes êdî newêre bêje siya te xwar e. Tu dest bi çi bikî, tu dê biserkevî. Tac û text jî heqqê te ye. Min heta niha riya rastiyê nîşanî te da. Min bide xatirê jin û zarokên min, min berde.”

Ristem bi dilekî şewutî got “Metirse berxê min! Ez dê welatê Mazenderanê hemî ji te re bihêlim. Lê belê karekî me yê girîng hêja maye. Em divê padîşahê Mazenderanê ji vir biqewurînin. Bo vê yekê ceng divê. Ya na, tu dê çawa bibî hakimê vî welatî?”

Her du hatin cem Keykawûs, binê bîrê. Dîlên wur bi vegera Ristem gelekî kêfxweş bûn û jê re li çepikan xistin. Kurê Zal li wur wuha axifî:

-Ya Şahê Cîhanê! Tu yeqîn bike ku mirovên xerabiya te dixwazin êdî najîn. Tola te li erdê nema, ji min bawer bike. Min zikê Dêwê Spî qelaşt. Ger tu bawer nakî, va ye dilê wî min ji te re anî. Emir bide, tiştek din heye ku ez bikim?

Kawûs bi kêf:

-Bila Xwedanê şev û rojan te ji me re bihêle! Art^ş û sazî, tac û text bi saya te hene. Kîjan dayik çok da erdê û te anî? Ew

144

kî be, gelekî pîroz e. Hezar car aferîn ji bavê te yê gernas re. Ji Zalê Zêrîn re ku tu ji xwîna wî yî û ji pişta wî yî! Bila haveynê bavê te li te helal be lawo! Qela Zabilê bi rûmeta te ser bilind e! Berxê bavê mino, de ka xwîna wî zalimî bîne, çend niqut berde çavê xalê xwe û çavên van leşkerân reben, bila ronahî têkeve çavê me. Da em jî karibin rûyê te yê mubarek bibînin.

Ristem rahişt dilê Dêwê Spî û xwîn jê guvaşt û çend dilop niqutand çavê Kawûs. Çavê wî ji nişka ve biriqî û mîna rojê çirisî. Piştre xwînê berra çavên dîlên din jî da, hemiyan ronahî dît. Bişirîn, rûyê wan şên bû. Digel Kawûs, Tûs û Gîw, Guhderz û Ferîbûrz, Gurgîn û Behramê Hêç jî ji zîndanê derketin. Hemî bi hev re berê xwe dan qesra padîşahê Mazenderanê. Gava gihîştin wur, Kawûs hilkişiya ser textê ji diranên fil û taca wî jî da serê xwe.

Iraniyan li wur şox û şeng li dar xistin; dîlan girtin, mey vexwarin. Heft roj û heft şevan sitran gotin. Roja heyştan, pêlewan li hespan suwar bûn, rahiştin gurz û şûran xwe, li nava bajarê Mazenderanê belav bûn. Kawûs ferman dabû, lewma hemî gelê Mazenderanê di bin şûr re derbas kirin. Xanî û zevî şewutandin û her cîhî wêran kirin. Werhasil dîwarek jî li piya nehiştin. Hetanî tarî ket erdê, şûran xwe ji xwînê paqij nekirin. Êvarê, Keykawûs wan civand û wuha got:

-Sûcdaran cezayê xwe dîtin. Êdî bes e, xwîn merêjin. Lê belê yek ji we, suwarekî şiyar û zana, bila biçe koşka padîşahê Mazenderanê û bila wî ji xewa kûr hişyar bike û ew bitirsîne.

Pêlewanê ku navê wî Ferhad bû derket pêş, Kawûs nameya ku li ser qumaşê hevrîşimî nivîsîbû da destê wî û ew şand. Di nameyê de wuha got:

“Ez ku Şahê Iranê me, dixwazim ji te re wuha bêjim: Tu fermanderê welatekî yî, lê mixabin bi saya dêw û pîrebokan

saziya xwe didomînî. Ger eql û mêjî bi te re hebe û dixwazî riya rast bibînî, dev ji textê Mazenderanê berde û were têkeve bin fermandariya min, ji min re xizmetê bike. Her sal baca xwe bide. Ger tu bacê bidî, em zerarê nadin te û tu dê li ser textê xwe bî. Ya na, mîna Erjeng û Dêwê Spî tê di xwînê de bigevizî.”

Ferhad axê maç kir û rahişt nameyê, çindik da hespê khêl.

Hesp di nava dar û diriyan de, di çol û zeviyan de beziya û xwe gihand qesra paşê. Dergevan ew berda hundur. Ferhad bi kincên niwînerekî çû, name da destê katib. Navê katibê wan Hûbît bû. Wî nameyê xwend. Xwend, lê belê her ku xwend qermûçekê eniya wî zêdetir bûn. Hûbît elama paşê pê xist ku Dêwê Spî hatiye kuştin. Çavê paşa tijî girî bû, dilê wî xeliya. “Roj diçe û şev tê, lê belê em ji Ristem nafilitin. Bûye bela û ketiye pêxîra me! Ew li serê dunê jî bûye bela.” Paşa nehişt Ferhad bizîvire; ew sê roj li qesrê dîl girt. Bang li pêlewanan kir û ew civand. Ferman da ku xwe ji cengê re amade bikin. Hemî li ser serê Ferhad kom bûn. Yek ji wan bi destê Ferhad girt û hetanî jê hat, destê wî bi hêz şidand. Hindik ma hestiyê pêçiyên wî bişkêne. Destê Ferhad êşiya, lê belê wî qet li eniya xwe dananî. Roja çaran paşa bang li Ferhad kir, jê re got : “Here cem Şah, bêje şerab û ava deryayê dibe yek? Qey tu nizanî ku şer bi min

re nabe? Çawa devê te digere, tu dibêjî were bibe xizmetkarê min? Qesra min jî ji ya te mezintir e, leşkeren min jî ji yên te pirtirin. Dêwên min berê xwe didin kîja welatî ew der xera dikin. Ne kevir dihêlin, ne mal û ne jî dar! Te nav û dengê Sence bihîstiye? Du hezar Senceyên min hene. Ger ez defa hewarê lêxim, tu dê şaş bibî; tu dê heyv û masî ji hev nas nekî! Xwe hazir bike ji min re. Ez dê we ji xewa xefletê şîyar bikim. Hezar û du sed fîlên min yên cengê hene. Ez dê toza Iranê rakim ku hûn erd û ezman ji hev nas nekin."

146

Ferhad vegeriya. Gotinên paşayê Mazenderanê yeko yeko ji Kawûs û Ristem re got. "Ew di nava ewran re difire." Ristem gava gotinên wî bihîst hêrs bû, kêliya axifî agir ji deva bariya: "Ez dê gelê xwe ji vê bêrûmetiyê xelas bikim. Ez dê weke niwînerekî herim Mazenderanê û şûre xwe bikşînim. Bila fam bike ku em serbilind in. Divê ez nameyek bi rêk û pêk û tûj binivîsînim. Gava ez gehiştim cem wî paşayê qurre, ez dizanim jê re çi dibêjim. Ez dê wî bi axaftinên xwe dîn bikim."

Nameya Ristemê Zal ya ku ji padîşahê Mazenderanê re nivîsî wuha bû:

"Ya padîşahê reşaşkirî! Tu ji ola xwe derketî yî! Gotinên te vala ne. Serê xwe ji ramanên wuha paqij bike û were vir. Di qesr û qonaxên me de xizmetê bike. Ya na, fermana ku em ji te re dişînin bincîh bîne. Tu dê encex bi vî awayî canê xwe xelas bikî. Heke na, tu dê bibî sebebê wêrankirina Mazenderanê. Ez dê bajarê te, bi ser serê te de hilweşînim. Teyrê sîsarik li benda xwarina mêjiyê te ye!"

Ristem rahişt nameya xwe û derket rê. Gava gehîşt nêzîkî Mazenderanê, gurzê xwe bi zîn ve hilawist. Lê belê padîşahê Mazenderanê nûçe girtibû ku pêlewanek ketiye rê û tê. Padîşah rabû, çend şervanên bijarte bi leq

wî ve şand. Dema Ristem çav bi wan suwariyên Mazenderanî ket, dest avêt darek li qeraxa rê û ew ji kok ve rakir, danî ser milê xwe. Leşkeren Mazenderanî li vê yekê şaş man. Heta wê rojê kesekî wuha bi hêz û cengawer nedîtibûn. Çokên wan sist bûn. Ristem ew dar bi ser wan ve avêt. Suwarî di bin de pelixîn û ruh dan. Pêlewanekî din derket pêşiya wî. Bi destên wî girt û mîna ku yê Ferhad şidandibû, wulo yê Ristem jî şidand, hêza wî ceriband. Lê belê kurê Zal bi pêçiyên wî girt û bi ser hev de heland. Madê pêlewan zer bû û ew ji ser hespê ve hat xwarê. Damarên destê wî qetiyan,

qevdika destê wî werimî. Pêlewanên din ji Ristemê Zal tirsîyan, nûçe gihîşt Padîşah, gotin hal û mesele ev. Wê demê bi navê Kelaxwur pêlewanekî Mazenderanî hebû. Ji bilî şer û pevçûnê ji tiştekî fam nedikir. Pilingekî har bû. Padîşah bang li wî kir û jê re got " here li leq wî niwînerê Keykawûs ve, hunerên nuh şanî wî bide. Bila zanibe ku mêr û şêrê me jî hene."

Kelaxwur nefesek kûr kişand, fişîn pê ket û madê xwe tirş kir, di bin awûrên tûj de çavê xwe bir û anî, spîçka çavê wî birbisî. Li dorhêla xwe nihêrî, xwe dîno mîno kir û çû pêşiya Ristem. Her du li hember hev sekinîn. Wî pêşî pencên xwe avêt ser Ristem. Lê belê Rsitem bi lepên wî girt, Kelaxwur jî lepê xwe lê şidand. Destê Ristem mor bû û êşiya, lê qet deng dernexist û di rûyê xwe de eşkere nekir, diranên xwe da ser hev û qirçand. Dor hat ser Ristem. Heta tê de hêz hebû destê Kelaxwur guvaşt, ew gav neynokên wî mîna pelên darên payizê weşiyan. Kelaxwur bi dilekî şikestî vegeriya cem Padîşah, jê re wuha got: "Ez çi ji te veşêrim jî, ji Xwedê nayê veşartin. Tu birînên destê min dibînî. A baş ew e ku, bi zarekî şêrîn pê re biaxife. Saadetê neguherîne bi felaketê! Em nikarin pê. Ger tu bacê bidî Iraniyan, ev ji me re çêtir e. Em dê ji nava gel zêran bicivînin û baca wan bidin. Ev ji kuştin û qetl û qîtalê ne baştir e?"

Hêja gotin di devê wî de, Ristem ket hundur, weke fîlekî debdebe qelafetê wî odê tijî kir. Padîşah hûr hûr lê nihêrî, ji serî heta pê awur lê gerand. Bi ba^ş li mil û sînga wî nihêrî û wuha got:

-Ristemê ku bi nav û deng e,

Lê gelekî jî leheng e,

Bêhna wî jî pir teng e,

Ala wî sê reng e,

148

Di cengê de zana û çeleng e, ew tu yî, an na?

Ristem:

-Tu eyb nakî? Ez li ku û Ristemê Zal li ku?

Padîşah:

-Mêrxasê bi ruşt,

Yê ku Dêwê Spî kuşt,

Ew egîdê gelekî bi rewuşt, ne tu yî?

-Naxêr! Ez ne kolê wî me jî? Nikarim avê jî li destê wî bikim! Xwedê ji te razî, rebenekî mîna min niwîner û pêlewanê miletê Iranî Ristemê kurê Zal qet dişibin hev? Ez li ku,ew li ku! Ew gava dikeve cengê mîna çiyayekî ye, lê ez? Nikarim gurzê wî jî ji erdê rakim. Ew çiya diguherîne deryayê û deryayê jî dike çiya. Gava dikeve şer, ji her cîhî qêrîn û nalîn tê. Ne dêw, ne fîl û ne jî şêr pê kare. Ew nabe niwîner. Lê belê ez dergevanê wî me. Bi min re name şandiye ji we re. Va ye wuha dibêje: Ya Padîşahê Mazenderanê! Heke piça mêjî di serê te de hebe, dev ji tovê neyariyê berde, bes biçêne. Bi xerez û buxdê, we gelek tişt anî serê pêlewanên

Iranî. Lê belê ew çax we hêja nav û dengê Ristem nebihîstibû. Ger Şah destûr bide û ez li hember we derêm, yek mirovekî jî ji we sax nahêlim. Ez dê we hemiyan di bin şûr re derbas bikim. Va ye name bi min re ye û wuha dibêje. De ji we re û baş bi xweynin.

Padîşah li aliyekî li axaftina wî û li alî din jî bi naveroka nameyê şaş ma. Hinekî hêrs bû:

-Tu çima wuha eletewş û bi kîn û xerez diaxifî? Çi hewceyî fesadiyê ye? Tu here jê re bêje, paşayê Mazenderanê dibêje ku, çawa pêlewan û fermandarê Zabilistanê tu yî, herwuha padîşahê vî welatî jî ez im. Di bin min de jî textê zêrîn û li serê min taca pederçahiyê heye. Ez jî xwey êl û xêbet im, nayêm ber piyê te. Kûr bifikire û baş hişê xwe bide serê xwe; tac

û textê mezinan nexwaze. Bona vê yekê wê serê te têkeve belayê. Ya tê berê dizgîna hespê xwe bi şûn de vegerînî, an na, rima mina poztûj dê dawîya jiyana te bîne! Tê zanîn ku tu bûyî hêsîrê xwestekê xwe yê kambax. Here jê re wuha bêje: Ya pêlewanê hêja! Heta niha Kawûs çi daye te û çi menfîeta wî gihîştiye te gelo? Ew çi dide te, ez dê sed qat zêdetir bidim te. Ez dê te bikim serfermandarê xwe û te di zîv û zêran de xenê bikim!...

Ristem tutişt negot, devê xwe jî venekir, lê belê di nava xwe de hêrs bû û tijî bû. Bîstkê bi şûn de, Padîşah kincek xweşik û hespekî Erebî anî bona “Niwîner” ji Ristem re bibe. Lê belê Ristem ne kinc û ne jî hesp qebûl kir. Bi hêrs ji ber textê wî rabû piya û xwe ji wur dûr kir. Bang kir:

-Ya Paşayê bêfikr û bêraman! Tê zanîn ku bextê te reş bûye. Pêdiviya Ristem ne bi xezîna te û nejî bi zengînîya te heye. Ew paşayê welatê Nîvrojê, kurê Zalê Zêrîn e. Kesekî mîna wî xweşmêr nehatiye dune. Carek

din qala wî meke! Navê wî bi devê te nakeve. Ya na, ger tu pir li dijî wî biaxifî, ez dê zimanê te jêkim.

Paşa gelekî kahirî, di cîh de enirî. Ji celladê kêleka xwe re

got:

-Lez bike, zûka vî niwînerê beradayî dîl bigre û sitûyê wî bişkênê!

Ew gav Ristem û Padîşah li jor bûn, celladê qesrê bi destê Ristem girt, xwest wî ji jor bîne xwarê. Lê belê Ristem bi destê wî girt û ew kişand jor, cem xwe û dû re bi piyekî xwe pêl ranê wî kir. Bi destekî jî bi ranê din girt û kaş kir, cellad kir du şeq. Sosretek wuha qet nehatibû dîtin. Qêrînek li nava serayê belav bû:

“Hey cahilno! Hûn nizanin ez kî me! Fermandarê Zabilê, lehengê Iranê Ristemê Zal ez bi xwe me. Ger Kawûs destûr bide em dê bi artışa xwe werin vir û hev û din li qeynter û mîzanê bixin. Ka Xwedê dide kî!”

Çavê wî bûbûn du fîncanê tijî xwîn. Bi vî halî ji qesrê derket. Vegeriya welêt, bi xwêdana rê çû cem Şah. Dîtin û ramanên xwe, bihîstin û nirxandinên xwe ji serî hetanî binî jê re got. Wuha bi ser ve kir:

“Metirse! Bila xetere ji te re çênebin. Xwe ji şere dêwan re amade bike. Ne padîşahê wan ne jî pêlewanên wan li pêş çavê min ne heba dendikê ne jî! Ev gurz besî wan e. Xwesteka dilê te wê were cîh.”

Ji alî din ve padîşahê Mazenderanê jî dest bi amadehiya cengê kiribû. Ad^şa xwe ji nav bajêr deranî, çadirê li deştê vegirt. Çol û pesar, çiya û newal bi leşkeran dagirt. Derzî li erdê nediket. Keykawûs nûçe şand ji Ristem re got, kembera zêr bide pişta xwe. Ji Tûs û Guhderz, ji Geşwat û Gîw û Gurgîn re jî nûçe şand got werin, roja cengê ye. Rim û mertalan, gurz û tîran amade kirin, sîngên konên ad^ê li çola Mazenderanê

çikandin. Di ordiya Iranê de, li alî milê rastê Tûsê lawê Newzer, li alî çepê Guhderz û Geşwat hebûn. Keykawûs di navendê de cîh girt. Leşker li dorhêla wî sef bi sef civiyan. U li pêşiyê jî pêlewanê rojê giran Ristemê Zal ala xwe kişand.

Mêrxasan li hev nihêrî, kîn û xerez ji hev kişandin, çav di çavan de sor bûn, awur di awuran de tûj bûn. Gava cengê destpêkir, pêlewanek ji nav Mazenderanîyan derket pêş bi navê Guya. Pêşî êri^ anî ser Kawûs. Çirûsk ji şûre wî dibariya. Zerxê wî dibiriqî. Nav di xwe dida: “Ez Guya me, pêlewanê ku wê li ber min rabe, hêja ji diya xwe çênebûye. Kî dikare avê bike toz, ew bila derê pêş!”

Kesek ji îraniyan bersiv neda. Pêlewanê Îranî tirsiyan, xwîn ji canê wan kişiya. Kawûs ev rewş dît, bang kir:

“Çi bû ji we? Qudûm di çokên we de nema, dilê we sekinî, xwîna we çikiya. Bila bizav were we, an na ûrt û ûcaxê bavê min wê ji dunê rabe. Çi ji we hat?”

Dîsa jî deng ji kesekî derneket. Hemiyan serî tewand, bûn kevirên goristenê wusa bêhis û bêçip. Ew çax Ristem serî bilind kir. Rima biriqokî danî ser milê xwe û dest avêt dizgîna hespê. Li Kawûs nihêrî û got: “Ger destûr hebe, ez dê li hember vî mendebûrî rabim. Sînga xwe bikutim sînga wî.” Kawûs bişirî ew gav û wuha lê vegerand: “Jixwe ev kar cardin li ser pişta te ma. Bila Xwedanê şev û rojan hevalê te be û dêw û pîrebok jî nêçîr bin ji te re.” Neviyê Sam hema gema Rexş sist kir û hejand, tozê bi ser serê xwe xist. Dema gihîşt meydana cengê, li hember Guya sekinî û wuha got: “Kesê bêesl û bêûrt tu yî? Wextê cezayê te hat. Diya te ya rebena belengaz, bila were û li ser meytê te bigrî!”

Guya di bin tan û niça Ristem de nema:

“Bi rastî, ya kezebperitî wê diya te be. Zerx kumzerxê te jî wê li ser ^ê te bigrîn hey neviyê teyr û turûdan!”

Ristem nema karibû xwe bigre, kişiya pêş. Guya ji zerp û hêrsa wî tirsiya, dizgîna hespê xwe li ba xist, çavê wî ket revê. Ristem da dû û mîna gurrîna ewran deng derxist. Ji paş ve gihîşt wî û rimê li nava pişta wî xist. Serê rimê li texma movik û bijkoşkên zerx ketibû helqeyan, ew ji hev belav kiribû. Rim di sînga Guya de avêt, xwîn ji deva rijiya. Ristem ew bi serê rimê ve rakir hewa û ji ser pişta hespê anî xwarê. Dêwê Guya di nava axê de gevizî û perpitî, hetanî can da. Pêlewanê Mazenderanî bi vê yekê ecêbmayî bûn. Fermandarê wan dît ku rewş xerab e. Got “çok biçikînin, bila besta we were.”

152

Pêlewanan cesaret girt û liviyan. Ad^ş hemî meşiya navenda cengê. Yên Îranî jî sist nebûn. Bêhna mirinê dîsa hat. Peyayan pêl zikê hev û din kirin, hin ji wan eçiqîn, hin ji wan di gola xwînê de fetisîn. Hewa reng guhert, bû weke rengê çemê Nîlê. Şûr û rim, mîna tîrêjên birûskê, di bin dengê def û boriyan de diçirisîn û şewq ji wan diçû. Al hilkişîyan, li ber bayê hilma pêlewanan pêl dan. Gotin Sefyan e an Deccal e hatiye ser rûyê erdê. Roj çima ji ezmanê heftan hatiye yê yekemîn? Rûyê erdê bû mîna deryaya qetranê ku pêlên wê ji xencer û rim û gurzan pêk hatibû. Gurre gurra ewran dihat, roj di tarîya nava vê teqanê de xeniqî bû. Hespên cisne ku piyê wan ji bayê bû, dişibiyan keştiyên nava vê bahrê. Fire fira pozê wan weke xuşe xuşa avê bû û kefa dev û pozê wan jî mîna kefika ser deryayê bû. Serî digindirîn, sîng û ber wesle wesle dibûn. Ristemê Zal di nava cendekan û nalîna birîndaran de, bi şûre ruhsitên rê ji xwe re vedikir. Her carekî ku şûr dihejand, ji nav dêwan qêrîn û hawar bilind dibû. Bi her

derbeyek şûr, deh serî digindirîn. Bi şiddeta gurzê wî dilê ezman parçe parçe dibû.

Ev ceng heftiyek domiya. Roja heyştan, Kawûs, kolosê malbata Keyanî ji serê xwe danî, berê xwe da rojê, giriya û dua kir. Zare zara wî li deşt û newalan olan da. Piştre rûyê xwe li ser axê gerand û çengek ax bi ser çavê xwe de kir. “Ya xwediyê vê ax û avê!” got, “tu me li hember van bêbavê dêwan rûreş mekî!” Piştre dîsa kolos da serê xwe, teylesan girêda û vegeriya nav leşkeren xwe. Di bin dengên têkel de art^ş keliya û ji cîh liviya. Padîşahê wan bang li Tûs û Guhderz, Gîw û Zenge û Gurgîn kir, got “Lawo, ez di bextê namûsa we de me! Hûn fîl û defan li pey ar^ê bînin. Ew gav alek li ser milê Guraze hebû ku heyşt gaz bû. Ferhad û Xerat, Berzîn û Behramê Hêç di tevgereke xweş de bûn. Ristem, berê xwe dabû navenda artışa

Mazenderanê, her diçû. Êla wan diterişand. Guhderz û Geşwad jî zor didan alî rastê. Heçî Gîw jêhatî bû, mîna gurê dev bi xwîn bû.

Ji tarîbana şevr, hetanî roj avêt û cardin çû ava xwîn herikî. Ne merhamet, ne dilgermî, ne jî mirovahî dihat bîra kesekî. Cendek li navenda cengê bûbûn kom û pirtiyên mêjiyê wan bi giyayê ve zeliqî bûn. Ji nişka ve, rûyê rojê jî hat girtin. Ristem, digel hevalên xwe hesp ajot ser Padîşahê Mazenderanê. Padîşah jî ew dît, lê belê ji cîh neliviya û nelibitî. Bi kîn û xerez û rik wulo rawesta. Dêwê wî jî ew gav êri^ anîn ser Ristem. Padîşah qêriya: “Lêxin lawo, sekin nîn e! Ji bilî cengaweriyê tiştek me xelas nake!” Bi vî dengî re, hemî dêwan bi carekê re şûr kişandin û li Iraniyan xistin. Her du adTş, mîna şeh û por li nav hev û din ketin, di hev re derbas bûn. Suwarê Rexşê Belek bi gurzê kalanî dixebitî, têdikoşiya. Laşê fîlan li erdê diciviya, xortuma wan weke gijika pîrebokan li nav hev û din diqelibîn. Kurê Zal êrîş bir ser Padîşah, lê belê ew ji rima Ristem bizdiya, çokên wî lerizîn. Ristem weke şêr gurmijî û rimê li nava qolincê wî xist. Zerx qul bû,

pozê rimê di movika piştê de qûç bû. Lê belê sêr li ser wî hebû. Ew bi xwe jî sêrbazekî pîrebokan bû, lewma ew gav ^ê wî guherî, hişk bû, bû zinarekî giran. Şûr tê de neçû. Ristem heyirî ma, xwîna wî ji vê sosreta giran cemidî, mêjiyê wî sekinî. Nema karibû tiştek bike. Di temenê xwe de tiştek wuha nedîtibû. Bê çare ma, zîvirî û paş ve çû. Rimê da ser milê xwe, hat cem Keykawûs.

Şah:

-Tu çima wuha dereng mayî? Çi bû, çi qewumî?

Ristem:

-Min keys li Padîşahê wan anî, rimê di pişta wî de çikand. Ez li benda ketina wî bûm. Lê neket. Seba ew bi sêr bû, canê wî

hişk bû û guherî, li ber çavê min bû zinar. Min çikir, bê feyde! Ew ji nava zinar derneket. Niha ez dixwazim wî bînim cem te. Dibe ku li cem te sêra wî xera bibe û dîsa biguhere û bibe mirov.

Şah ferman da, fermana padîşahan herdem bi xof û tirs û saw e. Pêlewan hemî li ber konê wî civîyan û rêz girtin. “Herin wî zinarî ji min re bînin!”

Hemî çûn, rahiştin zinarê bi sêr, lê belê gelekî giran bû, ji cîh nelibitî. Bang li Ristem kirin. Ew çû, mîna rake gurzê xwe zinar bilind kir û li ser pişta xwe danî. Meşiya, bi meşa wî re pêlewanê Iranî dan dû û li ser serê wî li çepikan xistin, zêr û zîv reşandin. Ristem ew anî, avêt ber textê Keykawûs. Kawûs ew gav li derve bû. Ristem bang li kevir kir: “Ya Paşayê Mazenderanê! Ji nava vî ta’tî bi hêsanî û xweşkahî derê der. Ya na, ez dê bi şûre xwe yê tûj û bivirê kevir te ji hev parçe parçe bikim.” Padîşahê Mazenderanê ev deng bihîst, kevirê mezin terikî û vebû, ew ji nav derket. Kumzerxê qul hêja li sera bû. Lê belê ew gav bû ewr. Ristem bi telpa ewr girt û anî cem Şah. “Va ye min ew anî. Ewul kevir bû, niha jî guherî telpek

ewr.” Kawûs lê nihêrî, Padîşah guherî, ket şiklek din: Mirovekî pîs, nelihevhatî û kirêt. Bejna wî direj, rûyê wî bi zuxruk bû. Ser û sitûyê wî, mîna yên mar bû. Wê kêliyê êş û elema cenga Mazenderanê hat bîra Keykawûs. Ji Ristem re got serê wî bipekîne, bila bicehime. Ristem bi riha wî girt û ew derxist derve. Li pêş çavê gel ew cêtî cêtî ji hev hûr kir.

Keykawûs, Ristem anî cem xwe û jê re wuha got:

-Te mêranî û cengaweriya xwe nîşan da. Bi saya te, ez gihîştim text û paytextê xwe. Heta dunya ava be, tu her hebî! Ristem nefsbiçûk axifî:

154

www.amude.de

-Ya Şahâ şârîn! Li dunê, her mirovek bi kêrî tiştekî tê. Ev kar û xizmeta ku min kir, ne ya min e, ya Ulad e. Bi saya Ulad min cîhê zîndanê hîn kir. Wî rê nîşan da. Min soz dabû wî, ger ez we xelas bikim, ez dê wî bikim paşayê Mazenderanê. Wî bawerî bi min anî. Niha ew li benda min û bincîhanîna sozê min e. Ger tu niha mohra Mazenderanê teslîmî wî bikî, çêtir e.

Keykawûs mohr û textê Mazenderanê teslîmî Ulad kir û tevî pêlewan û leşkerên Iranî berê xwe da welêt.

9.

Keykawûs vegeriya Iranê. Jin û mêr, zarok û pîr hemîkes li wî û pêlewanan civîyan. Bajarê paytextê seranser ji gul û sosin û beybûnan xemilandî bû. Dengê ney û rûdê belav dibû. Dengbêjan pêçî xistibûn guhên xwe û sewta wan dengvedida li nav qesr û qonaxan. Şah çû li ser textê xwe rûnişt û Ristem jî seba serpêlewanê Iranê bû, li rex wî cîh girt. Devê gencîneyê vekirin û diyarîyan li gel belav kirin.

Kawûs qatek kincê xweşik û nexşkirî, textekî ji fîrûze, tacek padîşahan ya bi zîv û zêr xemilandî, balgîfek ji zêr honandî, bazinek fireh û bi xişxişk, gerdenîyek, sed koleyên kemberzêrîn, sed cariyeyên porê wan ji miskê, sed hespên zînzêrîn, sed qantirên gemzêrîn, sed kasikên ji zêr, sitekanek ji aqûd û tijî misk, sitekanek ji fîrûze û tijî ava gulan ji Ristemê Zal re diyarî kir. Dû re hubr jê re anî. Di nava wê hubrê de misk û mey û ember hebû. Kawûs got: “Here bila riya te vekirî be, welatê Nîvrojê li te pîroz be! Serok û rêberê Iranê bila herdem bi te peznê xwe bidin. Dilê te bi şifqet be!”

156

Ristem meşiya, çû text maç kir. Li Rexşê Belek suwar bû, berê xwe da malê. Dema ji bajêr derket dengê defan hetanî ezman diçû.

Ristem vegeriya welatê xwe, welatê Nîvrojê, cîhê bav û kalan, Qela Zabilê, qerargeha Zalê Zêrîn. Şah, Tûsê Newzer kir fermandarê art^ê û rêveberiya Isfahanê jî xist destê Guhderz.

Sal buhurî, dem guherî. Padîşahê Hamawêranê, bi xap û bi kemîn Kawûs ji serayê revand. Keykawûs bi ecêbek giran wunda bû. Gel şaş ma. Rêveberî û hukumdarîya Iranê sist bû, dewlet bê serok ma. Piştî vê yekê mîrekên li sînorê Iranê çav berdan welat. Kîn û xerez cardin bijkuvîn. Efrasîyabê Bavpêşeng leşker civand û li tuxub bincîh kir. Gel ket xeterê, tirs li her derî belav bû: “Şîyar bin, êri^a Tûraniyan li rê ye! Wê werin, tola xwe bistînin!”

Lê belê nehatin, ew girseya leşkeran berê xwe da welatê Eraban. Ceng li dar ket; artışa Tirkan sê meh di welatê Ereban de ma bi şer û pevçûn. Gelek leşker û pêlewan hatin kuştin, di encamê de Ereb li ber Tûraniyan şikîyan û têkçûn. Efrasîyab, berê hespê xwe cardin da tuxubê Iranê. Li ser

vê bûyerê, zana û porspîyên Iranê li hev civîyan, lijneyek çêkirin, tevî nameyekê şandin cem Ristemê Zal.

Ristem rabû xwe girêda, hacetên herbê hilanî, nûçe şand çar aliyên dunê, ji dost û alîgiran re. Ji Zabil û Kabîlê û ji Hindê xweşmêr û pêlewan anî. Niwînerek jîr û çavvekirî li pêş şand ji Hamawêranê, bona ku ew Kawûs di zîndanê de bibîne. Herwuha niwînerek jî tev li nameyekê şand ji Padîşahê Hamawêranê re û jê re wuha got:

“^tên ku te kirine, tofana ku te bi ser gelê Iranê ve aniye, şîrheramiya te nîşan dide. Te bi dek û dolaban Keykawûs dîl girt. Ev ne mêranî ye, cahilî ye, ji xwe fedî bike. Şer û ceng bi

merdî û mêranî divê. Ger tu bixwazî ji penceyên min bifilitî, zûka Kawûs azad berde! Ez gava biryara cengê didim, şûm min tîmsehê binê bahrê jî dişewutîne. Ez bi navê Hurmuz, bi roj û heyvê sond dixwum bi sonda temam, ez dê heyfa Kawûs û welatê Iranê ji te bistînim. Ger tu ji min bawer nakî, ji zana û giregirên xwe bipirse, ew ê bêjin te nav û dengê min. Bila cengawerên Mazenderanê ji te re bêjin min çi anî serê Poladê Gundî, Erjeng û Dêwê Spî?”

Bersiv zûka hat ji Hamawêranê; padîşah wuha digot: “Çavê Kawûs êdî deştê nabîne. Tu kengê dixwazî were! Suwariyên min dizgîn di dest de, li benda we ne. Piştî ku tu dixwazî bi piyê xwe têkevî dafikê, qey ben û qeyd tune ji te re? Di zîndanên me de cîh gelek e.”

Ristemê Zal piştî van gotinan bihîst, wuha sond xwar:

“Ez bi mohr û gustîla Şahê Iranê, nanê Qela Zabilê kim, ez dê welatê Hamawêranê ji destê yekî mîna te zalim û bêbext xelas bikim! Ez dê te li meydana herbê, mîna çivîka li şîşê velorînim!"

Piştre ferman da, leşker û pêlewanan kincê cengê li xwe kirin, hesp deranîn ji tewlê, defa cengê lêxist. Pêlewan û lehengê Iranî bi hespan çûn

heta qeraxa deryayê. Li wur, li keştî û kelekan suwar bûn. Dema li wî aliyê qeraxa deryayê pê danîn ser axê, Ristem ji wan re axifî:

“Hevalno! Leşkeren min yên pîroz! Bi riman êri^ bikin û nefesa wan biçikînin. Ez bê sebr im; dixwazim zûka derêm meydana cengê!”

Qamçî li ranê Rexş xist, hespê wî rabû ser her du lingên pêş û hîrîya. Suwarî ketin nava coşeke bêhempa. Li rasta cengê gelek tîr û rim civîyan weke zeviya qamîşan. Ristem ji wan netirsiya, lewma hesp ajot navenda wan. Leşkeren Hamawêranî

158

kêliya li bejn û bala wî û li gurzê destê wî nihêrîn, ji tirs û sawa wî qolincî bûn. Qefesa sînga wan ji dilê wan re teng hat. Ew gav terq li artışa wan ket, ji hev belav bûn û reviyan. Padîşahê wan nihêrî ku rewş xerab e, bang li du leşkeran kir; yek ji wan şand welatê Misrê, yê din jî şand Berberistanê. Di nameya ku dabû destê wan niwîneran de wuha nivîsî:

“Ez di tengasiyê de me. Em ji berê û paşê de birayên hev in. Welatên me, ji hev û din ne dûr in. Lewma jî em mîna yek dewêlek tên hesêb. Di rojên bextewarî û xweşîyê de, di felaket û xerabiyê de, dilê me bi hev re lê dikeve. Ger hûn alîkariya min bikin, ez dê li dijî Ristemê Zalê cengê bikim. Niha ew ketiye axa welatê min. Ger ez xwe xelas nekim, sibehê ew dê bigihîje tuxubê we jî. Ew çax, ev agir wê we jî bişewutîne.”

Padîşahê her du dewletan nesekinîn û di hewariya Padîşahê Hamawêranê de hatin. Çiya bi çiya, newal bi newal, çol û pesar, deşt û zozan hemî bi simê hespên xwe dewusandin û binpê kirin. Kevir û zinar gêndir bûn, nebat şikestin û pelixîn, kêzik û kurmik li bin dest û piyan çûn. Toza nalê wan mijê çêkir. Ristem ew mij dît, ket xeterê. Ji Keykawûsê dîl re nameyek din şand, wuha got:

“Padîşahê sê welatan li ser serê min civîyan, hêzên xwe kirin yek. Ez natirsim ji cengê, lê belê fikara min ew e ku ev ceng zerarê bigihîne te. Pêşiyan gotiye: Ji xeraban xerabî çê dibe! Ger tu nexwazî, ez cengê nakim. Min textê Berberistan û Hamawêranê navê.”

Keykawûs bersiv ji zîndanê şand:

“Dev ji min berde, li min nenihêre. Ma dunya hemî ji bona min ava bûye? Jixwe çerxa felekê ji mêj ve ye wuha ye. Jehrî bê hunguv, hezkirin jî bê dijîtî nîn e. Tu gema hespê xwe yê

pirçbelek serbest berde û guhên wî bi hesinê serê rima xwe bixwurîne û miz bide!”

Dilê Ristem ket cîh; destûr girt. Êdî firîqet bû, dizgîna Rexş ber bi navenda cengê zîvirand. Gava gihîşt cîhê mirin û xwînrêtinê, bang li wan kir: Kî di nava xwe de ji xwe razî ye û mêrxas e, li hember min derînin, bila serî rake. Iroj Hurmuz ya wê bide min, ya jî wê bide we!”

Deng ji kevir dihat, lê belê ji wan nedihat. Çûçik serî hilnanî. Bêdengiyek aram bersiva wî da. Heta roj tîrêjên xwe di pişt ava deryayê de veşart, ev bêdengî domiya. Bû şev; tarî dîsa rijiya ser av û axê. Ristem paş de hat, cîhê xwe bin kon. Ew şev têr raza û xwe rihet kir. Dotira rojê bi serê pozê tavê re pêlewanên xwe yên bijarte xist rêzê û cardin xwe berdan cîhê cengê. Dît ku her sê padîşah jî li wur amade ne; tevî artışa xwe li benda wî ne. Kurê Zal, ew gav li ser milê xwe li ba ket, li pêlewanên xwe nihêrî û bi sewtek cesûr bang kir:

“Gelî heval û hogiran! Çavê xwe vekin! Ji bilî dizgîn û damûska hespê xwe û hesinê serê rimê, li tiştekî nenihêrin. Dijmin bi sedan, an jî bi hezaran be, ji me re ferq nake. Şika min nîn e ku em dê biserkevin. Metirsin, ez bi we re me!”

Ji Berberistanê sed û şêst fîlên hêç anîbûn. Sed fîl jî yên Hamawêranê hebûn. Artışa Misrê li rex wan cîh girtibû. Hîre hîra hespan, xurmîna dengê fîl û dêwan bû. Çiyayê Elburzê zerx li xwe kiribû! Rûyê erdê guherîbû hesin. Bi halanên mêrxasan çiya dinaliyan, dil û cegerên şêran diperitî. Teyrên berate bêhna xwînê hilanî bûn, li ezmana basik vekiribûn, li benda ^ê mirî bûn. Ewr ji vê rewşê ditirsiyan û ji hev belav-welav dibûn. Her du alî art^ên xwe bi tekûzî xistibûn rêzê. Guraze xwe da alî rastê û Zuwareyê şêr û dilejder jî alî çepê girt. Navend, mîna hercar cîhê Serpêlewan bû. Kemend bi terkiya

160

zîn ve hilawistibû. Belê ew, dîsa ew hatibû û fermana lêketina borîyê dabû. Rim li erdê çikandin, mîna darên devîyekî şên kirin. Agir ji pozê Rexş dibariya dîsa. Bi dengê boriyê re ceng destpêkir. Şingîn ji şûran çû, gurmîn ji gurzan. Mertal mîna baskên teyran geh fireh dibûn geh teng. Çend saet wuha bi germî buhurî. Bi şîta xwînê, meydan bû çemê Zemê. Bela ji ezman dibariya; hemî li ser hespan bûn. Mirina zer diket spîçka çavê kesên li erdê. Leşkeren her sê welatan kom kom reviyan. Ristem ew gav Rexş ajot ser Padîşahê Şamê. U kemend avêt, pişta wî zeft kir. Gava kişand, zerxê pişta wî qetiya û benê kemendê di hestiyê movikên wî de rûnişt. Ristem ew ji ser zîn anî xwar û dest û piyên wî girêda. Padîşahê Berberistanê jî tevî çil zilamên xwe ket destê Guraze. Li alî din, Zuware jî weke şêrekî hêç û bêhawe xwe avêt ser Mulûkê Misrê; şûre xwe yê ku li jehrîyê mijiyabû, avêt serê wî. Bedena wî kir du qet û li erdê raxist.

Padîşahê Hamawêranê ev rewşa xerab û têkçûyî dît. Ew gav, biryara xwe guhert. Li Ristem nihêrî ku çi bibîne! Bi şûre xwe yê tûj qiyametê radike! Niwînerek şand cem kurê Zal, xwestina aşîtiyê pêşniyazî wî kir û sozek

wuha da: “Ez dê Keykawûs azad berdim û ew bînim hetanî Hamawêranê. Ez dê çadir, gencîne, tac û text û cariyeyên kemberzêr jê re diyarî bikim.”

Padîşahê Hamawêranê ji eniya cengê vegeriya bajêr û bi şêwurmendên xwe re qise kir, Keykawûs serbest berda, ew anî cem xwe û pê re peyman çêkir, dev ji kursiyê pederçahiyê jî berda, Kawûsê Keyanî xist dewsa xwe. Li gor vê peymanê, Ristemê Zal jî dest û piyên leşkeren dîl vekir û ew azad kir.

Keykawûs textekî ji aqûd û fîrûze amade kir, ew bi zîv û zêr xemiland, li ser pişta hespekî rehwan bincîh kir û Rûdabe li

ser suwar kir. Li sûkê gel jê re li çepikan xist û lîland: “Bijî! Tu her bijî diya şrrîn! Te tenê çok da erdê û kur anî! Lawê te rûmeta te ye. Tu bi wî gelekî bextewar û serfiraz be!”

Kawûs suwariyek mîna niwîner ji Kayserê Rûm re şand, jê re got: “Ji min re leşkeren jêhatî û wêrek, herwuha dunyadîtî û şervan bişîne. Ez dê wan bişînim welatê biyanî.”

Çend roj bi şûn de nameyek ji Ereban hat ji Kawûs re; tê de wuha nivîsî bû:

“Em hemî di bin fermana te de ne. Bi saya te em dikarin bi serbestî bijîn. Me bihîst ku Efrasîyab dixwaze textê Iranê bidestxîne. Xewna mirîşka birçî dibîne, lê garis dûrî wî ye! Rojekê li me û wan jî qewumî, me bi rim û şûran li hev û din xist, felekan ji hev re çêkir! Me ji wan kuşt, wan jî ji me.

Em bawer in ku pederşahîya te, her diçe bi hêz dibe û tu xurt dibî. Em dê alîkariya te bikin!”

Fesadî û gelacî cardin destpêkiribû. Galgalên di derheqa Tûraniyan de her diçû zêde dibûn. Hin kesan digot, leşkeren wan bi dizî ketine tuxubê

Iranê, hin jî digotin gelek çek kirrîne û xwe ji cengê re amade dikin. Bona vê yekê Kawûs name nivîsand ji Efrasîyab re:

“Fesadî û galgala di derheqa te de, êdî serê me werimand. Bes e! Tu derhal hemî hêzên xwe ji Iranê bikşîne. Tu çima çavê xwe berra welatê me didî? Ev çavbirçîtiya te wê bibe bela li serê te. Ji heddê xwe derneyê! Tu jî dizanî ku Iran ne bêxwedî ye. Piling çiqas bêhawe û hêç be jî, nikare xwe têxe nava pencên şêr! Tu ji malbatek Tirk î û te ala meznahiyê vekiriye. Lê belê pêşiyan gotiye: çi tê serê quling ji qêrîna wî ye. Xwe neke quling. Divê tu êdî têkevî riya eql û zanyariyê. Ger welatê te wêran û kambax bibe, paşê poşmanî pere nake. Heke ez artışa xwe têxim cengê, dunya wê li serê te bibe zîndan. Leşker û

162

pêlewanên me yên mêrxas, çek û pûsadên me gelek in. Wê serê te yê di nav ewran de, têxin bin axê!”

Name mohr kir, da destê niwîner û şand. Dema niwîner gihîşt qesra Efrasîyab, ew gav padîşahê Çînî jî li wur bû, li gor urf û adetan axê maç kir, peznê padîşah da û name teslîm kir. Eniya Efrasîyab bi xwendina nameyê re qermiçî, xêzên rûyê wî pirtir bûn û lêva wî jî miçiqî. Piştre madê wî reş, çavê wî jî sor bûn. Di ber xwe de wuha kir pile pil: “Kawûso! Ger Iran têra te bikirana, te çav bernedida Hamawêranê.” Qirçe qirça diranê wî diçû xanedanê Çîn, lê belê wî deng nedikir. “Tu jî dizanî ku, ez gava biryara cengê bidim, masiyê bin çeman jî ji tirsa şûre min dipijin û bi ser avê dikevin. Ez amade me û ala şer hildidim. Ya şahê dilreş! Min art^ek ji bi gurz û rim, tîr û kevan, mertal û xenceran hazir kiriye. Ez dê dersek wulo bidim te ku, tu dê êdî behsa Iranê jî nekî! Jixwe axa Iranê ya min e. Du sebeb bo vê yekê hene: Yek, ez ji malbata Tûrê kurê Ferîdûn

im û dudo; min bi hêza van milê xwe axa Iranê ji dagirkeriya Ereban xelas kir.” Di dîroka Keyaniyan de cara yekemîn bû ku leşkeren biyanî jî mîna alîkar vexwendî bûn Iranê. Şe^a^n Rûm bona êri^ek mezin li Iranê bûn, di nava sefên pêlewanan de cîh girtibûn. Kawûs vê carê rêça xwe guherî. Ji Berberistanê rabû, berê xwe da nav welatê Ereban. Ji wur ên^ kir û du sed hezar leşker derxist meydana şer. Ristemê Zal, li ser pişta caniyê belek ji navenda artışa Iranê damûsk hejand û mîna berê, dizgîna hespê dîsa ber bi navenda koma leşkeren Tûranî ve sist kir. Xwe li nav wan xist ji hev terişand û belav kir. Bi her êri^ekê re, bi pozê rimê gelek pêlewan li erdê raxist û suwarî pengizand. Efrasîyabê Bavpêşeng çelengiya Ristem dît. Bi sê dengan gazî peya û suwariyên xwe kir:

“Egîtên mino! Şâr û pilingên mino! Lawo, îroj roja cengê ye. Min bi destê xwe mîna bav we mezin kir ku hûn jî di rojek wuha de karibin dijminan di bin şûr re derbas bikin. Dem dema hêz û qewetê, roj roja namûsê ye! Nerevin, di ber xwe bidin, hetanî şer li dar be, serî pêl nekin. Cîhanê li serê Kawûs bikin tara bêjingê! Bila bibîne hêz û qeweta, çavsorî û hîkmeta Tirkên devbixwîn! Wan yek bi yek bikujin. Lê belê temeniya min li we, hûn hay ji Ristemê Zal, gurê sebatê devbixwîn hebin. Ger hûn wî nas nakin, ez dê mşa^n wî ji we re bêjim; ew şervanekî bi dest û pê, qelafetfîl e. Di destê wî de gurzê kalê wî Sam heye ku di şik^ serê ga de ye. Zînê bin wî ji çermê piling e. Ala wî ala Kawa ye, hespê bin wî piştsor û belek e. Çav û birûyên wî reş in, lê belê por xelek e! Pir çalak û pir wêrek e. Heke we keys lê anî wî nekujin, bi zindî bînin cem min. Hûn dikarin serê wî têxin kemendê. Pêlewanê ku ew ji min re bîne, ez dê gelek diyarî bibexşînim jê re. U ez dê qîza xwe jî lê mar bikim.”

Bi dengê wî re pêlewanên Tirk êri^ kirin. Rimên wan ji alava êgir, şûran wan ji brûskê bûn. Sîng di sîngê de, enî li eniyê, şûr li ser şûr şer kirin. Bîstkê wuha domandin, hin hatin kuştin, hin birîndar bûn û hin jî bêkeys

ketin. Hesp li ser herî û teqana xwînê şemitîn. Di encamê de Iraniyan zora wan birin. Erîşa Tirk şikiya. Efrasîyab, tev li leşker û pêlewanên xwe ji ber Ristem reviya. Ji bajarê Gûrê, berê xwe dan welatê Tûranê.

Bi rastî ev ceng, cengeke xweser bû û gelek taybetiyên xwe hebûn. Berî her tiştî, ev cengek navnetewî bû. Ji bilî Iranî û welatê Nîvrojê, Berberî, Hamawêranî, Rûm û Ereb û Misrî jî tê de cîh girtibûn. Şerekî girîng bû, lewma di encama şer de, Keykawûs xelatek gelek bi nirx û bêhempa bi sînga Ristemê Zal

ve kir. Belê, xelata pîroz ya “Pêlewanê Cîhanê” piştî vê bûyerê bû para Ristemê Zabilî.

10.

Kawûs qesrek mirêsdar li ser çiyayê Elburzê ji Pêlewanê Cîhanê re ava kir. Dêwên Mazenderanî ku berê hatibûn dîlgirtin, gelek av û ax û kevir bo avakirina qesrê li pişta xwe kirin û kişandin ser çiyê. Mîna koleyan xebitîn. Kevir û zinar hatin rewêrtin. Qesr bi qasî deh kemendan bilind kirin. Li rex wur, tewla hespan ava kirin. Nava tewlê bi kevir û hesin û bizmaran, bi rêk û pêk çêkirin. Deve û welaq jî li wur xwedî kirin. Cîhekî fireh, eywanek gelekî mezin, ji bona şevên di^ahiyê, vexwarin, reqs û şox û şengê, di navenda koşkê de cihê kirin. Bi taybetî, kevirên xweşik ji Yemenê anîn û bona perwerdeyî û xwendinê kumbetek lêkirin. Du ode jî, bona cebilxanê pêk anîn û derîyekî hesinî li ber xistin.

Rojek ji rojan Ristemê Zal Pêlewanê Cîhanê Li qesra xwe ya nuh rûnişt. Dilê wî yê bi kovan, birçiyê hezkirinê, belengazê eşqê bûbû. Mîna tiştekî kêm, leystikokek di canê wî de dileyist. Aramiya ruhê wî wunda bû. Di qesrê de eywanek bi navê Navend hebû, rabû, gazî qewraşan kir, ew der xemilandin. Bang li hevalên xwe kir. Tûs û Guhderz, Geşwat û Behramê

Hêç, Gîw û Gurgîn, Zengeyê Şaveran û Gustehem, Xerat û Berzîn û Guraze li dora xwe civand. Got “Hevalno, hogirno! Ma jiyan bi tenê şer û ceng e. Qey ne bese lo! Em ji bêhna xwînê beecîn û kerixîn. Ka bêhna şevê û şerabê çewa ye? Ka em hinekî jî bi leystika bav û kalan bi Guy û Çevgenê bileyzin lo!”

Meygeran mey gerand, pêlewanên Zabilê û îranê vexwarin û stran gotin, pêkenokan bi lêv kirin, keniyan û rojên derbasbûyî, rojên kambax ji bîr kirin. Li kêfa xwe nihêrîn. Şevbêrkên xwe şên kirin. Demekê wuha bi kêf û dîlan buhurandin.

Rojekê dîsa wuha serxweş û sermest bûbûn, Gîw di cîhê xwe de qirqilî, xwest tan li Ristem bide û wî biqehirîne. (Jixwe ji bilî wî kesek nikarîbû henekan bi Ristem bike. Seba ku ew zavê Zal bû, xuşka Ristem li cem wî bû.) Gîw:

-Ya Pêlewanê Cîhanê! Tu dibêjî mêr di ser pozê min re tune û kesek nikare di ber siya min re here, nêçîrvanê herî baş im. Madem wulo ye, rabe em herin têkevin zevî û baxçeyên Efrasîyab, zozanên Tûraniyan biçêrînin û tê de seyda pezkûviyan bikin. Ger tu mêrekî jêhatî bî, rabe, em biçin, rûyê roja bi şewq, bi toza ber piyên hespê xwe û bi baskên başokan serxêlî bikin. Rabe em herin şêran bi şûr bikujin, gakûviyan bi kemendê bigrin, bi çatkêşan maran bikujin, bila başok jî ji me re çivîkên semanek bigrin.

Ristem bişirî û li zavê xwe nihêrî, bi dengekî bilind:

-Lo helal be ji te re! Te ev gotin ji ku anî? Tu her hebî! Ev gotina te bi serê xwe ye û gelek li xweşa min çû.

Gîw:

-Mebesta min ev e ku, gava zarokên me mezin bibin, da sêrpêhatiyek me hebe ku em ji wan re bêjin. Divê em sibehê bi berbangê re li pey xezal û pezkûviyan bibezin. Li vegerê, em dê şeraba xurmê bi ser goştê

pezkêviyan de biniqutînin. Ristemo, ma tu nizanî! Gava goştê pezkûvî li mîrata şerabê dimije çiqas xweş e! De bixwe, heta zikê te pê direpise!

Pêlewanan jî deng nekir, li xweşa wan jî çûbû. Wan jî serenc dixwest.

166

Dotira rojê, berî berbangê şiyar bûn û kincên seydê li xwe kirin. Lê belê xencer û şûr, tîr û kevan, kemend û mertal û gurzan jî bi xwe re hilanîn. Berê xwe dan çemê Şehdê. Li rê lerizîn, geh hesp ajotin, geh bi loqê çûn. Ji tuxub buhurîn, xwe gihandin axa Tûranistanê, cîhê seyda Efrasîyab. Ji aliyekî şire şira ava Şehdê, ji aliyekî jî dengê teyran ji ser çiyayekî bilind dihat. Li aliyekî wan bajarê Serhasê bû, li pêşiya wan jî deştek gelekî fireh hebû, pezkûvî û ask tê de çindik didan. Şêr çav bi wan ketin û reviyan ji lanên xwe. Kêliya wan dest bi seydê kir, teyrên berate ji bin ewran derketin û xwe dan ber rojê. Bi nukulên khêrî ên^î ^ên rawur û heywanên mirî kirin. Başok û baz ji meytê kewan pir hez dikirin. Pencên qertelan di xwînê de gemirîn.

Ristem bi şêr û guran re şer kir, berra pey gakûviyan da. Pezkûvî û xezal ji kemenda wî xelas nebûn. Dilê şêran ji şûre xwe re kir kewdan. Ew roj hetanî êvarê nêçîrek xweş kirin. Vegeriyan Navendê, li wur kirin gêta goşt. Rûniştin û li rûdê xistin. Ma kambaxa rûdê deng li ser hebû! Kezeba mirov diperitand; gava muzîka kilamek dilşewat lê diket, dilê mirov pê re dianî xwarê! Dengê wê li zozanan belav dibû û olan dida. Hefteyek wan wuha buhurî; stekanên meyê ji dest dananîn. Her yek ji wan deh şûşe şikestin, li bin guhê dîwaran xistin. Geh dîlan girtin, geh çîrok û stran gotin. Bi methelokan keniyan, qerfa avêtin hev û din carna jî. Roja heyştemîn Ristem li rewşê nihêrî, pêvajoyek wuha neket serê wî; bivê nevê zilamek dunyadîtî bû, lewma ji wan re wuha got:

-Em niha wuha bêxem ê xeyal, bêderd û elem dikenin û şa dibin. Lê belê em tiştekî ji bîr dikin. Texmîna min ev e ku Efrasîyabê bela serê me, niha bi vê yekê hesiyaye. Ger ew ji nişka ve bi ser me ve bigre, niha em ji şer re ne amade ne, wê

me hemiyan bikuje. Destê min li ser dilê min e; ditirsim ku em nêçîrvan bibin nêçîr! Ka em yekî ji nav xwe hilbijêrin û bila ew heval çavdêriya me bike. Gava rewşek xetere dît, an tiştek çêbû, bila were ji me re bêje, me ji xew şiyar bike.

Guraze xwe avêt pêş, lê belê kurê Zal berî ew bişîne lê şîret kir:

-Bazde û biçe qeraxa çem. Riyek ji alî Tûranê tê heta ber çem, tu çavê xwe ji wê riyê neneqîne. Şîyar be!

Guraze û du peyayên din bi hev re çûn. Yên mayîn jî dîsa dest bi kêfê kirin.

Ji alî din ve, mirovek Tûranî, pêlewanên Iranî dîtibû li nav zeviyan û li seydê. Li hespê xwe suwar bûbû û xwe gihandibû qesra Efrasîyab. Nîvê şevê ew şîyar kiribû û ji nava nivînan rakiribû.

Efrasîyab radibe, kincê malê ji xwe dike, kincê cengê li xwe dike, gurz û xencer û şûr hiltîne û bang li pêlewanên xwe dike:

-Rabin, zûka rabin, ne roja razanê ye! Iranî hatine zozanên me diçêrînin, di axa me de, nava bax û baxçê me de nêçîrê dikin. Divê em ji nişka ve bi ser wan ve bigrin û ew hêsîr bigrin. Ji xwe fermandarê artışa Iranê hemî li vir in. Piştî ku me ew dîl girt, ka Kawûsê reben kare çi bike? Ezman wê lê bibe qula rovî! Rabin, xwe ji “seydê” re amade bikin, em dê mîna wan derkevin seydê! Em dê wan bi vî awayî bixapînin û heke me keys dît, ew gav em dê weke dilê xwe bi wan re bikin.

Sê hezar leheng ji nava art^ê bijartin. Ew kesên jêhatî bûn. U pisporê şûr hejandinê. Padîşah li wan şîret kir: “Qethen di rê de meçîn, di nava şûv û

zeviyan de herin. Newal newal, çol û pesar, çiya û gelî bimeşin. Bi roj û şev ranezên, bila xew ji we re heram be. Li keys û fersenda xwe binêrin.”

168

Guraze ewrekî reş dît ku ji dûr ve li çolan belav dibû û dihat. Artışa Efrasîyab bû ew ewr! Ala reş li pêşî pêl dida. Lez kir û zîvirî bin kon, cîhê Ristem. Lê mixabin Pêlewanê Cîhanê ji vexwarina meyê êdî serxweş bûbû û hêja jî qadeh li ser qadehê bi ser xwe ve dikir, bi sînga xwe ve dirijand. Dîmen li xweşa Guraze neçû, bang lê kir:

-Ya pêlewanê bi nav û deng! Niha ne wextê sermestiyê ye! Çi li te qewumî ye gidî? Me îcar ji bav û kalên xwe zêde kir! Di demek nêzîk de wê bobelatek were serê me ku kesekî di dewr û zemanan de nedîtibe. Zûka here serê xwe bişûne, bila hişê te bicive. Tirkan bi ser me ve girt malnemîrato!

Ristem ewul, mîna her car di ber xwe de bişirî, tevgera xwe hîç xera nekir, dû re jî bi hire hir keniya. Bi kenê xwe ziko pişto bû. Guraze li ber çoka wî bû, quncirîkan dida wî, digot “Ristem! bavê mino, kalê mino, deng bibe xwe! Ez çi dibêjim ji te re? Dijmin di ber guhê me de ye! Hindik ma dengê simê hespên wan were. Lê tu li vir li kêfa nizam çikê xwe dinihêrî!” Ristem hîç guh neda wî. Serxweş e, ne bi min e, ne bi te ye! Dikeniya, heta nefesa wî diçikiya dikeniya. Êdî histêr ji çavên wî hat. Li ser milê xwe li ba ket got: “Hey rebeno, belengazo! Tu çima fikaran dikî? Tu di ta”têla çi de yî? Piçekî mêr be mêr! Kezeba tajiyê bi te ra heye malneketo! Talih û oxira serkeftinê, jixwe çawa hebe bi me re ye. Metirse, ez bi gurzê xwe, bi hespê khêl û bi zerxê xwe besî wan im. Ez ne ji Efrasîyab û ne jî ji sitûlayên dora wî ditirsim. Bi qasî serê derziyê jî ji wan fikaran nakim. Bila ji Iranê jî kesek di hewariya me de ne yê. Yek pêlewanek me, bi du hezar mêrên

wan e. Lo meygero! Tu çi sekinî yî? Ka ji wê şeraba Zabilê bîne. Bila qirika me piçekî şil bibe lo!” Sakî hat, stekan tijî kir û da wî. Ristem stekan bilind kir û got : “Noş! Ji Şah Kawûsê Keyanî re! Bila canê wî ji me re sax be bes e. Bila dîzika wî tijî, şûre wî jî tûj be!”

Gîw ji cîh hilqevizî û got “Şûre wî tûj e, lê belê yên me ko bûne! Ev çi hal e! Va ye ez diherim, riya padîşahê Tirkan dibirim. Kî tê, na yê ew zane! Ez nahêlim ew di ser pirê re derbasî vî alî bibe. Bila li wî alî hinekî meşxele bibe. Hûn jî xwe amade bikin ji şer re. Dema kêfê kêf, dema cengê jî ceng divê!” Gîw, li bayê bezê xwe gihand ber pirê. Lê belê dereng mabû. Efrasîyab û digel artışa xwe hatibûn vî alî. Ew li pêş bû û ala wî ya reş li ber bayê direqisî. Gîw tîrê li kevanê xist. Hevalekî wî zîvirî Navendê, nûçe gihand Ristem. Pêlewanê Cîhanê nesekinî, rabû piya. Zerx li xwe kir, gîzma fenerî kişand pê, kum û kolosê xwe xwar kir û mertala ji mifriq danî ber xwe. Xavê kemendê bi zînê hespê ve girêda, gava li caniya nalşûşe û piştsor suwar bû, hîrîn ji heywanê çû. Ev deng li qot û newalan belav bû. Kêliya beziya li çolê, simê wî nîv mîtro di axa sist de çû xwarê. Mûyên damûska Rexş û yên dûva wî digihîşt hev. Gîw û Gurgîn bi tîr û kevan, Behramê Hêç û Zengeyê Şaveran bi gurz, Berzîn û Ferhad jî bi şûre Hindê xwe nîşandan û li pêş derketin, Li benda fermana Pêlewanê Cîhanê man. Pêşî dengê def û boriyên cengê hat. Bi vî dengî re Gîw xwe dîn kir; bû mîna şêrê nêçîr wundakirî. Li çar aliyê xwe tîr weşand û derba wî fewt neçû. Her tîrek, barîn ji yekî dibir. Tîrên Gîw malik li wan xera dikir. Lewma cesaretê wan şikest, çav berdan revê. Lê belê Efrasîyab nehişt û bona cesaretê bide wan, hespê xwe ajot navenda pêlewanên Iranî. Ristem gava çav bi wî ket, gurzê risas da ser milê xwe, ajot pêşiya wî û kurê Geşwat jî bi gurzê xwe da dû. Pêlewanê Cîhanê bang li fermandarê Tûranî kir:

-Malxerabo! Niha hewce bû te leşker li ser serê me civand? Tu di vê şeva tarî de ji nav cîhan rabûyî, bo çi? Em jî te nas dikin û tu jî me nas dikî. Şûre me li ku bilind dibe tu jî zanî. Tu zanî ku cîhê Ristem lê hebe, art^ş feyde nake! Ez û Gîw besî we ne. Yên din zêde ne. Hûn ne mêrê şer in, hûn yên himêza jinan in. herin malên xwe, nava nivînên germ! Hey Tirkê reşaşkirî! Tu layiqî cenga mêrxasan î? Lawo tu here weke jinan teşiyê li çoka xwe bixe û bade. Mîna qîzan jî di nava cariyan de rûnê û desmalan binexşîne! Ez dê bi vî şûre Hindê yek derbek li serê te bixim ku zerx û kumzerxê te jî bi te re bigrîn!

Efrasîyab li ser van gotinên Ristem, tirsiya û paş ve gahv avêt. Lê belê bang li Pîran û Pîlsem, her du birayên hev, mêrxasên roja xerab kir. (Bavê wan Weyse gelekî jêhatî bû, Tirkan jê hez dikir.) Xasma, baweriya Efrasîyab bi Pîran hebû. Lewma berê xwe da wî û jê re wuha got:

-Te gelek ceng dîtine, gelek bela di serê te re buhurîne. Roj roja xîretê ye, dizgîna hespê vegerîne ser Iraniyan. Wan bişkîne û meydana cengê paqij bike! Ger tu biserkevî, gava em welatê Iranê dagir bikin, ez dê av û axa wur hemî bi qurbana te bikim, taca Kawûs bidim serê te!

Piştî vê gotinê, besta Pîran rabû, dilê wî bi gulpîn lê xist, ji nava ar^ê weke bagerê li hev zîzikî, bi hezaran Tirk jî dan dû wî. Hemî jî şe^a^n xencerê bûn. Xencer di heliqandin, davêtin û ji dûr ve li nav pişta mêran dixistin, tê de çik dikirin. Tavilê dor li Ristem pêçan. Çaxê Pêlewanê Cîhanê ew dîtin, bû mîna kefê û nepixî, hema Rexş ji cîh rakir. Êdî derya keliyabû. Pêl bi pêl wê bihata. Mertal bilind kir, da pêş eniya xwe, bi qevda şûr girt û hejand. Got “Hel hel! Ez bavê we me lo! Hûn cîhê şi^ me lê çikandiye nizanin hêja!”

Efrasîyab xwe dabû kêlekê û temaşe dikir. Ji Pîlsemê cem xwe re hêdîka wuha got:

-Ger ev ceng heta êvarê bi van Zabilî û Iraniyan bidome, suwarîyek jî ji me namîne. Em gava hatin vir, weke şêran bûn, lê belê ez niha dinihêrim ji bilî kewroşk û roviyan kesek ji me nabînim.

Pîlsem li vê yekê hêrs bû, tan lê ket. Ew mêrekî ji nava xwe tije, ji xwe razî bû. Li welatê Tûranê, kesek nikarî bû pê re şere yek bi yek bikirana. Bi çavekî sor, wuha li Efrasîyab vegerand:

-Ez qehremanê vî gelî me. Li hember min ne Tûsê bêtirs, ne Gîwê bi nav û deng, ne Behramê Hêç, ne jî Zenge û Guraze dikarin serî hildin. Ew li ber çavê min ne qurtek qimiz in! Ferman bide, tan û niça li min nexe, tê bibînî ez dê çewa seriyan di ber milan de bifirînim! Tu dê li ber çavê xwe bibînî, ez dê çawa heyva wan ya siûdê di bin ewrên reş û tarî de veşêrim!

Efrasîyab:

-Ne roja fortan e! Here mizgîna serfiraziyê ji min re bîne! Lê belê ev şîreta min bike guhar û bi guhê xwe ve daleqîne: gava te hesp ajot ser Ristemê Zalê, gelekî şîyar be. Ew weke Ehrîmen dilxerab e, xwey dek û dolab e, qurnaz û devbixwîn û bi hestî û kab e, çavê te lê be, tucar pê nexap e!

Pîlsem sîqilî, bû xwê û ket agir. Halan di xwe da û êri^î komiza cengê, cîhê gurr kir. Bi gurz û şûr li çep û rast xebitî, weke bayê bakur bi pêş ket û xwe gihand Gurgînê Iranî. Şûr hejand, lê Gurgîn xwe tewand, şûr li serê hespê wî ket. Hesp likumî û li ser piyên pêş daqulî erdê bû. Gustehem vê yekê dît; hema lez kir, ji cîh pengizî, rim avêt nav pişta Pîlsem. Lê belê ew rim tesîr li pêlewanê Tirk nekir. Rim şikest, darê rimê ket ser

172

axê. Pîlsem lê zîvirî û şûr avêt serê wî, devê şûr kumzerxê Gustehem hilanî, kum li ser axê zîzikî. Gustehem wulo bêrim û bêkumzerx li navenda şer şaş ma. Zenge li halê wî zû şîyar bû. Caniya wî ya qemer bizerx bû, ew

ajot. Mixabin Pîlsem rê li wî jî birrî û zerxê hespê wî kir du parçe. Zenge ji ser zîn daqulî xwar bû. Parçê zerx civand, kembera xwe dîsa girêda û ber bi Pîlsem ve çû. Li alî din jî Gîw hebû, wî hukmê Pîlsem dîtibû û zanibû. Weke brûskek ku ji çiyê berjêr bibe, hat di hewara hevalên xwe de. Pîlsem netirsiya û nereviya, bi her çaran re jî cengê domand. Geh bi gurz, geh bi şûr li wan xist. Di hev û din de xwêdan dan. Pîlsemê Weyse betilî. Pîranê birayê wî xwe gihand wur û bang li Gîw kir:

-Tu mirovekî biesl î, xwey eşîr î! Lê belê ev tevger bi te nakeve! Ne eyb û şerm e, hûn çar kes li birayê min hatin hev. We dor lê pêça! Mêranî yek bi yek û teko teko divê.

Pêlewan li hev û din sor bûn. Ristem nêzîkî wan bû. Pîlsem li hember wî sîng kuta. Lê belê ejderhayê Zabilî ew tirsand. Pîlsem ji ber wî zû reviya, canê xwe xelas kir.

Iraniyan gelek leşkeren Tûranî kuşt, pir jî birîndar hişt in. Efrasîyab rewşa artışa xwe, ew rewşa kambax dît; kezeba wî peritî û qêriya. Qêrînek wulo ku, hemî di cîh de rawestiyan û nelibitîn.

-Kanî egît û fêris"

Ka pêlewan Elkûs"

Ka mêrê pezn û fortan"

Gava ew serxweş dibû,

Çavê xwe li Ristem digerand!

Elkûs çokên xwe li kêlekên hespê xist, “deh” kir û hat li ber Efrasîyab sekinî. “Ez ji mirinê re me!” Lê belê fermandarê Tirk bi çavekî ba^ş û bêbawerî hûr hûr lê nihêrî, got: “Ger tu

tenê herî, Ristem wê te bikuje, av bi ser te de venaxwe. Pêlewanan bi xwe re bibe.”

Hezar kes, digel Elkûs xwe ji art^ê cihê kirin. Ew li ser riya xwe prşî xwe gihandin birayê Ristem Zuware. Ew dişibiya kekê xwe.

Ji Elkûs tirê ew Ristemê Zal e,

Nîzanî bû ew Zû-War e!

Zuware, weke gurê har e,

Dijmin dikin qare ware,

Dibêjin hewar e, hey hewar e!

Dunya ne zivistan, ne havîn e,

Ne payiz e, lê belê buhar e,

Mêrxas halan didin,

Birîndar dikin nale nale!...

Zuware bi rimê êrîş kir,

Lê Elkûs hespê xwe li ba kir,

Rima Zuware şikest,

Dil tirsand, ew perîşan kir,

Dîsa çok çikand, şûr kişand,

Piştre gazî û hawar kir...

Cengê kirin, gurz rakirin, şikest şûr,

Zuware qêriya, birîna wî gelekî kûr.

Zuware ji ser hespê ket. Deng jê hat birrîn. Elkûs xwe avêt ser. Xwest serê wî jêke. Lê belê Ristemê Zal di hewara birayê xwe de hat, wuha bi ser Elkûs re bariya:

-Tu zanî pencên şêr çawa nin? Tu nizanî. Ger te zanibûna, tu hewqas ji ola xwe dernediketî!

Elkûs ji wur dûr ket, Ristem rahişt milê Zuware, ew bi wî halê birîndar û bixwîn li hespê suwar kir. Lê belê Elkûs cardin zîvirî ser wan, rimê li kembera Ristem xist. Serê rimê di zerx de erqilî û ma. Kurê Zal serê xwe zîvirand û wî jî rimek pengizand serê Elkûs. Xwînek boş pijiqî.

Piştî ku Elkûs hat kuştin, leheng û şerva^n wan tirsiyan. Ew gav, heft pêlewanên Iranî û Zabilî bi hev re şûr tazî kirin û ketin êri^ê. Efrasîyab nema karibû di ber xwe bide. Fam kir û qenc bawerî anî ku bi Iraniyan re dernakeve serî. Qamçî li hespê xwe da û rakir telebê, reviya. Gava Ristem da dû, di guhê Rexşê Belek de wuha got: “De bibeze caniya belek, bibeze! Tu heywanek bi fam î, te heta niha rûyê min reş nekir, serê min berjêr nekir. Xwe sist meke! Li ser pişta te, ez dê ruhê paşayê Tûranî bistînim û bi xwîna wî, vê deştê bi rengê mercanê rengîn bikim!” Rexş baskê xwe vekir; damûska wî li ber bayê pêl da û li vî alî wî alî rûyê Ristem mizda. Dengê simên wî diket kerrika guhê Efrasîyabê Bavpêşeng û mîna dengê piyê ruhsitên ew dibizdand. Ristem hêdî hêdî xwe nêzîk kir û kemend weşand ser, xwest ben li nava wî bipêçe. Kemend li zengûya wî erqilî, Efrasîyab tavilê xencer ji ber xwe kişand û ew birrî. Çend qamçiyê din li hespê xist û zor dayê. Di xwêdanê de şil bû û lêvên wî miçiqîn, dev û diranên wî li hev ket, canê wî lerizî.

Suwariyên Tûranî jî dan dû wî. Hemî weke pirtikên ber bayê firiyan wî aliyê çem.

Iranî vegeriyan cîhê xwe, birîna Zuware xedar bû, ew derman kirin, li ser doşekê dirêj kirin. Yekî ji wan hekîmiya wî kir. Yên din dîsa dest bi seyd û nêçîrê kirin. Ristem ji seyda

pezkûvî û gakûviyan pir hez dikir. Cama bi tena serê xwe bi roj û şev li çol û çiyayan digeriya.

Rojekê dîsa tîrkeşa xwe tije tîr kir û derket seydê. Berê xwe da tuxubê Tûranê, alî welatê Semenganê. Xwe berra quntara çiyayekî da, piştre bergehek vekirî derket pêş çavê wî; berriyek wulo ku ne serî hebû ne jî binî. Ripî rast bû, te hêk danîna ji deh fersahan dihat dîtin. Gakûviyan tê de zîtik davêt, mûziyan didan xwe û digeriyan. Kêfa wî hat, got qismetê min fireh e û berê Rexş da wur. Bi tîr û kevanê û bi xavê kemendê çend gayên kûvî zeft kir. Birçî bûbû, lezand, darên hişk û pûş civand û agir vêxist. Gava terrafa êgir qenc sor bû û pêt biriqîn, şaxeke ter ji darê jêkir û goşt li darê ter xist, cîtiyên goşt kir rêz. Goştê sorî kurr xwar, li hestiyên tijî mox mijiya. Rabû û çû ser avê, lîçî ava qerisî bû, têr vexwar. Paşê serî xist xewê.

Heft-heyşt peyayên Tirk di wê berriyê re buhurîn. Li çayirê û li qeraxa çem şopa simên hespekî dîtin. Li pey şopê çûn, Rexşê Belek li ser mêrgê di çêrê de dîtin. Dor lê pêçan û kemend avêtin sera. Rexş neket dafika wan, zîtik avêt du kes ji wan birîndar kir. Serê yekî gez kir. Rêwiyên Tirk gelekî li dora wî çûn û hatin, kirin nekirin ew neket dafikê. Bîstkê wulo bi hev û din meşqele bûn. Rexş xwe xelas nekir; serê wî xistin ben û ew hişk girêdan. Paşê lê suwar bûn û ew birin bajêr.

Li Bajêr, gel lê civiya, gotin “Ev hespê kî ye?”, rêwiyên Tirk gotin “Yê Ristemê Zal e, me ew li çolê girtiye û aniye.” Kesên xwey mehîn hatin, mehînên xwe anîn, ew dan ber Rexş bona ew rabe ser wan da caniyên baş ji haveynê wî çêbibin. Kirrîn ji kezeba Rexş diçû, jixwe ew jî li tiştek wuha digeriya, ji mêj ve bû ku wî heywanetek mê nedîtibû. Lewma yê nava ranên xwe mîna milekî rep kir û carek dudo di ser çend mehînan

re derbas bû. Xwediyê wî di xewa kûr de li çolê xewnan didît, Rexş jî li kêfa çîkê xwe dinihêrî!

Ristem demek bi şûn de şiyar bû. Çavê xwe li Rexş gerand, li newalan meyzand, ew nedît. Vir de çû û wur de hat, hisa caniyê nedihat. Axîn kişand û berê xwe da bajarê Semenganê. Bi rê ve, bi xwe re wuha axifî, kire pile pil:

“Ka ez dê wuha piyatî û serberjêr çawa vegerim malê? Ez dê bi çi halî tîrkeş û gurzê giran, kumzirîç û şûr û zerx hilbigrim? Di vê çola fireh de, ger dijminek leqay min bibe, ez dê çawa xwe biparêzim? Sibehê, gava Tirk bi vê yekê bihesin, wê bêjin ‘Xwelî li serê Ristem be! Mîna mirîyekî serî xist xewê, xelkê jî hat hespê wî dizî!’ Lê çare nîn e, piştî ku hevalê min yê sadiq wunda bû, ka çi ji destê min tê? Ez dê çek û mertal û zerxê xwe hilgirim û bimeşim. Jixwe halê dunyalikê ev e: carna mirov li zîn suwar dibe, carcarnan jî zîn li mirov!...”

Ristem xwe gihand bajarê Semenganê, li qeraxa bajêr li deriyekî da, xortekî derî lê vekir. Ristem xwe pê da naskirin. Malûm e, ew bi nav û deng bû, hemîkesî navê wî bihîstibû. Xort ew li wur hişt, çû qesra paşê, got hal û mesele ev, Ristemê Zal hatiye, hespê xwe wunda kiriye. Paşa û fermandarên wî bi hev re hatin cem Ristem. Paşa:

-Çi bû, çi qewumî gidî? Kî bêbextî bi te kir? Em hemî ji fermana te re amade ne, hemî pêlewan û çekên me di oxira te de ne.

Ristem:

-Ne hûn bipirsin, ne jî ez bêjim. Rexşê min li ser mêrgê diçêriya bêgem û bêzîn. Hema ji nişka ve wunda bû. Min da pey şopa wî, hetanî bajarê we hatiye. Texmîna min ew e ku ew li nav bajêr e. Ger hûn karibin ew bibînin, qenciya we bêbersiv

nahêlim. Lê belê ger ew neyê dîtin, bona we jî ne baş e! Xelkê bêje Semenganîyan hespê Ristem dizî!

Paşa:

-Ya pêlewanê leheng! Kesek newêre xerabiyek wuha bi te bike. Tu îşev bibe mêvanê min; sibehê Xwedê mezin e. Dibêjin Sibeh tê û xêr pê re... Tu çi bêjî, em dê bikin. Were em îşev bi hev re şûşan li bin guhên hev xin, dilê xwe şên bikin, xem û xeteran deynin aliyekî. Ji hêrsê tiştek dernayê. Hespê te, hespek xuyanî ye, wê têkeve kîja qlukî? Ew nayê veşartin, here ku derê, wê were dîtin û nasîn. Sebir bike tu. Em dê lê bigerin û ew bibînin.

Piştî gotina paşê, fikarên dilê Ristem hinekî belav bûn, kela dilê wî daket, hêrsa wî buhurî. Berê xwe da qesra paşê û ew şev bû mêhvanê wî. Paşa qesr û qonax xemiland, bang li sazbend û dengbêj û govendgêriyan kir. Sifra xwarinê li erdê raxist. Dengê rûdê bilind bû. Dû re meygerên rûsor û bêhnxweş di nava kincên rengale de anîn. Xwarin û vexwarin, hetanî nîvê şevê bi hev re axifîn, derheqa deng û behsên dunê de qise kirin. Nîvşevkî, ji wî serî de Ristem sermest bû û ji xwe ve çû. Mazûvan, oda razanê jê re amade kir, ew bir ser nivînan.

Şev bû. Stêr li ezman dixuyan, lê belê hêja heyv nehilatibû. Bêdengîyek aramî bi ser bajarê Semenganê vegirtibû. Mîna ku bajêr jî bi bajarvaniyan re ketibû xew. Çirrîn ji deriyê oda ku Ristem lê radiza hat. Ew deng li eywanê belav bû. Silûetê mirovek pordirêj û yekî din jî li pey li ber derîyê odê peydah bûn. Di destê mirovê paşî de mûmek hebû, nîvê rûyên her duyan ronî dikir. Bêhna emberê ji mûmê dihat. Ristem bi pêjna piyên wan çavê xwe vekir. Dest avêt şûre bin balkîfê xwe. Çi bike, jîyana wî ev ders dabû wî. Mûm ode ronî kir. Ristem şaş ma, destê xwe ji ser şûr bi şûn de vekişand; qîzek

xama li hember wî bû. Koleyê pê re jî, mûm digirt. Çavê xwe çend caran neqand, got ev xewn e, an ji hukmê şerabê ye. Dîsa nihêrî. Belê, rûyê keçikê weke heyvê dibiriqî, ne hewceyî mûmê bû û ne hewceyî stêrkan bû! Fîstanek xweşikî melesî li xwe kiribû û bêhna miskê di xwe dabû. Birûyên wê mîna kevanê bûn, bijang jî her yek tîrek bû. Pora wê qasî kemendê dirêj bû. Bejna wê taya rehanê, hinarkên rûyê wê ji akîkê Yemenê bûn. Devê wê qula derziyê bû!

Bi salan bû ku destê wî bi keçekî nebibû. Jixwe şer û pevçûn nedihişt ku hesên zayendî bilibitin û hezkirina jinan di dilê wî de bipijkuve. Xwîn dîtibû û her bêhna xwîn û xwêdanê jê hatibû. Qevda şûr, jê re qevda destê yarê bû! Bêhna mê, bêhna jinan, kenê keçan çi bû, ji bîr kiribû. ew Pêlewanê Cîhanê bû û devbixwîn bû. Dikuşt, tenê dikuşt. Seriyan digindirand, sitûyan jê dikir. Por û sitû miz nedabû heta wê gavê. Ji vexwarina şerabê hez dikir û ji seydê û hew! Maçkirin çi ye, mizdan, bêhn kirin tiştekî çawa ye?

Wî li keçikê nihêrî, keçik jî li wî. Xwe negirt:

-Tu kî yî? Di tariyê de li vir çi dikî?

Bi pirsa xwe jî poşman bû. Bêdengî dehî xweş bû! Nihêrîn

j'î!

Dengekî zelal, tenik û nizm di wê tarîgewrikê de belav bû: -Ez Tehmîne me. Qîza paşê. Ez hîç ji mal dernayêm. Ne kesek min dibîne û ne jî dengê min dibihîze. Min te li kêleka bavê xwe dît; min nav û dengê te berê bihîstibû. Gava ez çav bi te ketim, tiştek ji nava min qetiya, nizanim çima. Dilê min mîna yê kevoka kûvî ku têkeve dafikê hilperikî û ez lerizîm. Çîrokên derheqa te de, li civatan gelekî tên gotin. Min bihîst ku tu ji dêw

û şêr û pilingan jî natirsî. Dibêjin ku, gava şêr û piling gurz di destê te de dibînin, dilê wan disekine. Ji tirsa rima te ya poztûj,

ewr jî rondikên xwînê dirêjin. Gava te şûşa şerabd bi bavé min re bilind kir, min zimanê xwe gez kir. Ji mêj ve ye, min dixwest te bibînim; niha Hurmuz te ji min re şand. Ez îşev dilkeser û dilteng bûme; xewa min reviya. Dikim û nakim çavê min naçin ser hev. Min xwest sîng û navmilên te, zend û bendên te ji nêz ve bibînim. Li vê odê, di tarîbana vê şevê de masî û çûk, teyr û turûd jî me nabînin. Ez li ser te dîn im, tu bizanibe.

Ristem guh da gotinên wê, baş dêhna xwe da awûrên wê. Bawerî pê anî, ew ne keçek cahil û vala bû. Fam kir ku ew keçek xwey fikr û raman e, hay ji dunê heye. Hêdîka destê xwe ji nav cîya dirêjî wê kir. Koleyê mûm di dest de zîvirî û bêdeng derket der. Her du çav ji çavan neneqandin, hetanî lihêv bi ser serê xwe de wer kirin.

Ew şev gula nuhbişkuvî, qîza ter û teze bi dilopên barana jiyanê ku di huburdanka wê de civiya, şil bû. Agirê dilê xwe temirand, kesera kûr ya dil haş kir û qinyata xwesteka canê xwe bincîh anî. Lê Ristem? Bedena wî germa nuh ya evînîyê ku ji cenga dêwan, ji şere pêlewanan mirov bêhtir dişewutand nas kir, lê belê dilê wî li ser ban nebû, ramanên wî lê hûr nebûn. Mîna roj di pişt çiya de bibişire û kêliyekê ew germ bike û dîsa here ava. Lê belê dax bû ev, şewutandibû û ev şewata pêşîn jî tucar nedihat ji bîr kirin.

Sibehê, gava rojê weke her car bi dunê re dest bi leystikê kir, Ristem mohra xwe ku mîna hemayilê bi milê xwe ve girê dida vekir û ji Tehmîne re diyarî kir. Jê re wuha got:

“Rake vê mohrê û veşêre. Dibe ku ewladek ji te re çê bibe. Ger ew qîz be, vê mohrê bi porrên wê ve bike, ger kurik be bi masûlkên milên wî ve mîna

bazbendê girê bide. Bila diyariya bavê xwe hetanî mirinê wunda neke. Ger ew kur be, texmîna

min ew e ku ew dê li kalê min Sam here. Seba ku Mala Zalê hemî li wî diçin.”

Ristem ji nav cîya rabû. Ji bavê keçikê re ev bûyer eşkere kir. Sibehê li ser taştê hemî mûbîd û porspîyê Semenganê civandin. Li gor urf û adetên wê demê wan zewucandin. Bo vê yekê gelekî kêfa padîşah hat. Piştî ku Ristemê Zal bû zavê wî, Paşa hesabê hêza xwe ya sîyasî kir.

Dotira şevê odeyek ji bûk û zavê re cihê kirin û ew şev jî Ristem li wur, bi Tehmîne re ma. Bi hev şa bûn. Lê belê behsa pêşeroja xwe nekirin. Rêça Ristem, rêça cengaweran bû, ew nikarî bû li Semenganê bimîne; Pêlewanê Cîhanê bû, divê vegeriya Iranê, rêveberiya pêlewanan û fermandariya ad^ê bikirana.

Koleyê ku şevek berê bi Tehmîne re hatibû oda Ristem, bi heyecan bazda û hat hundur. “Rexşê Belek hat dîtin! Rexş li sûkê ye! Wa ye tînin malê!” Bi dengekî zirav diqêriya. Ristem bi vî dengî re bazda derve. Kêliya caniya belek çav bi suwarê xwe ket, pozê xwe di gemê de bir û anî, qirika xwe dirêj kir û kin kir. Xwedî ji rewşa wî fam nekir, lê xwe nêzîk kir, pirça wî mizda û paşê jî ew şûşt û tîmar kir.

Sî qasî bejnekê kurt bûbû û tîna tavê zêde bûbû, ew gav Rexş ji tewlê deranîn û zîn li ser edilandin. Ristem li ber derî destekî avêt gema hespê, destê din bi milê jina xwe girt û ew himêz kir, ser û çavên wê li pey hev gelek caran maç kir û xatir jê xwest. Dû re jî destê xezûrê xwe maç kir û serê hespê belek berda, gema wî sist kir. Rexş pêşî li paş xwe terisî û sînga xwe da bayê. Tehmîne li pey wî nihêrî û tevî dilê birîndar bi rastiya xwe re rû bi rû ma.

Ristem berê xwe da Sîstanê. Çend roj bi şûn de gehîşt wur û ji wur jî berê xwe da Qela Zabilê. Em wî li wur bihêlin, werin ser Tehmîne.

Tehmîne ji Ristem bi hemle ma. Piştî neh meh û deh rojan zarokek kurîn jê re çêbû. Lawek bi dest û pê bû û bi ser û sêncê xwe jî li Ristem û Sam çûbû. Navê wî, bi mana rûbikenî û ronakbîrîyê "Suhrab" danîn. Zarok gir bû; roj di rojê de qam berdida. Hêja yek mehî bû, bi qasî zarokek yek salî bejna wî direj bû. Sînga wî, çav û birûyên wî jî li alî bavê çûbûn. Gava gehîşt pêncsalîya xwe, meraqa pêlewaniyê jê re çêbû. Heçî ku bû deh salî, zarokên di temenê wî de êdî kesekî pê nikarî bû. Suhrab li cem diya xwe û kalê xwe yê paşa mezin bû. Ji bavê xwe re kûvî ma û qet hezkirina bavê nedît. Di malê de zarok ew tenê bû, lewma hemîkesî jê hez dikir û bo vê yekê jî rûgirtî û pir şaqizî mezin bû. Bitir bû, zû dixeyidî û mîna hemî zarokên bêhezkirin zû hêrs dibû. Rojekê ji diya xwe re wuha got:

-Dayê! Bejna min ji ya hemsalên min gelekî direjtir e. ez naşibim sîp û sengeleyên vî bajarî û li alî xalanê xwe jî neçûme. Ka bêje ji min re, alî bavê min kî ne, ez ji malbata kî me dayê? Zarokên hevalên min li navê bavê min dipirsin. Di nav hevalan de fedî dikim seba ku navê bavê xwe nizanim. Bavê min kî ye? Heke tu navê wî nebêjî, ez dê ji mal birevim. Ger tu derheqa bavê min de her tiştî ji min re nebêjî, bila şîre te li min heram be. Ji niha û pê ve tu ne diya min î!

Tehmîne nihêrî ku zarok jîr e, çiqas mezin dibe, bêhtir tiştan miraq dike. Nexwest êdî ji wî veşêre:

-Hêrs nebe lawê min! Şanaz bibe bi malbata xwe. Tu kurê Ristemê Zal î. Tu ji nesla Destanê kurê Sam î. Sam di dewra xwe de mêrxasekî bi nav û deng, serpêlewan û fermandarê Şahê Iranê bû. Tu nabînî serê te digihîje ezman? Ev bejn bejna Sam e

lawo, pêşiyên me wusa dibêjin. Tu ji tuxmê pêlewanan, ji serbilindê welatê Nîvrojê yî! Here li ser çoka kalê xwe yê paşa rûnê, bila ji te re bêje. Mala Zalê maleke pîroz e lawo. Xwedayê şev û rojan, ji wexta ku dunya ava kiriye suwariyek mîna Ristemê bavê te neaniye ser rûyê axê. Felek jî hefza xwe ji kalê te Zal dike. Ez ji nezera heram dûr im lawo. Ji bilî Ristemê bavê te, destê tu mexlûqî bi min nebûye! Bavê te diyarî ji te re şandiye. Ez dê wan bidim te. Şîreta min li te, wan wunda meke.

Tehmîne Xanim rabû, çû alî odê. Devê sindoqek biçûk vekir, jê keseyên tijî aqûd, sê keseyên tijî zêr û nameyekê ji kurê xwe re anî. Ristem, çend roj berê, sedemî salvegera jidayîkbûna Suhrab ew ji Zabilê şandibû. Tehmîne bi ser ve kir:

-Rake van. Ez dê niha mohra bavê te jî bi milê te ve bikim. Mîna bazbendê ew bi xwe re bigerîne. Hetanî mirinê veşêre. Ji kesekî re nebêje ez kurê Ristemê Zal im. Lawo Efrasîyabê Bavpêşeng ger bibihîze, wê te bikuje, an wunda bike. Ew neyarê malbata Zal e. Kîn û xereza wî gelek e. Ez naxwazim tu herî Zabilê, cem bavê xwe jî. Seba ku bavê te bibihîze ku tu bûyî xort, wê te ji min cihê bike û li cem xwe bincîh bike. Dayika te reben e lawo, ez tenê me. Ez dê bêyî te çawa bijîm di vê dunya xerab de? Tu kezeba min î, ruh û canê min î, naxwazim derdê te bikşînim berxikê diya xwe.

Suhrab serê xwe rakir:

-Dayê! Gotina te heq e. Te bi şîre helal min mezin kir. Ka hela bêje: li ser rûyê erdê, kî dikare navê bavê xwe veşêre? Nepeniyek wuha di dil de bi abadinî dimîne? Iranî qala serpêhatiyên Ristem dikin. Ew mirovek pîroz e. Ez dê çima navê wî ji xelkê veşêrim? Ez eslê xwe înkar nakim. Gava ez

dest bi şer bikim, ez dé ji şervanân Tirk artâşek amade bikim, ârîş bikim ser Şah Kawûs, ew ji ser text bînim xwaré û tacé ji sera bikim. Ez dé Tûs û Gurgîn, Guhderz û Gîw, Gustehem û Behram jî bikûjim û çiqas gencîneyén Irané û welaté Nîvrojé hebin, ez dé hemiyan bidestxînim û bidim bavé xwe Ristem. Taca Kawûs bidim seré bavé xwe û ez dé li rex wî rawestim, parézgeriya wî bikim. Piştre, ez dé beré xwe bidim Tûrané, serî li ber Efrasîyab jî hildim, ez dé qesra wî bi ser seré wî ve hilweşînim. Ew gav tu dé bibî prensesa Irané! Tené tiştek ji te dixwazim: hespekî jéhatî. Bila canîyek wulo be ku simén wî ji mifriq û pola bin, gava pélî kevir bike bihére bike toz, bila bi teyran re bifire, mîna masiyan ajné bike û bi xezalan re jî bibeze. Hespekî bi héz be bila, ku bikaribe ev gewdé min yé giran û biviré desté min hilbigre.

Tehmîne:

-Heqqé te ye, tu édî xort î, pélewan bé hesp nabe.

Tehmîne rabû û çû cem seyisé Semengané û jé re got here nava tewlé hemî caniyan bîne û li hev bicivîne. Revokén çolé jî bîne bi tewlîne.

Roja din, seyîs hesp civandin, Suhrab çû nav wan, kemenda xwe avét seré wan, hespan girt û yeko yeko ceriband. Tu hesp nikarîbû ew hilbigre, bedena wî gir bû, li bavé xwe çûbû. Li kîja hespî suwar dibû, ew di bin de mexel dihat. Pélewanekî Tirk ev yek bi çavé xwe dît, hat cem Suhrab û got: “Hespekî min heye ji xwîna Rexşé Belek e û weke bayé payizé dibeze. Mîna giraveke nav deryayé dixuye, lé gava ku bazdide, mîna teyré baz basiké xwe vedike. Li deşté gava dide pey yekî, mîna tîra ku ji kevané dipeke bilez digihîje kesé li péş xwe.” Şewq û alava kéf û şahiyé ji rûyé Suhrab bariya. Ew pélewané Tirk, wî caniyî ji Suhrab re anî. Kuré Ristem ew

eciband û pirça wî mizda, jé hez kir û ew hînî xwe kir. Dû re zîn li ser pişté şidand, gem xist deva û lé suwar bû. Rimek diréj ku mîna suluxé xaniyan bû girt desté xwe. “Li ser pişta vî hespî, ez dikarim édî kabûs bi Kawûs bidim dîtin!”

11.

Wext buhurîn, sal guherîn, Suhrab mezin bû, édî çû néçîré, bikaranîna haletén herbé hîn bû. Li şere pélewanan temaşe kir. Rojeké çû cem kalé xwe yé Padîşah:

-Kalo! Destûra te hebe, ez dixwazim herim Irané û ji wur derbasî Zabilistané bibim, bavé xwe bibînim û ew nas bikim.

Kalé wî jé hez dikir, got:

-Bila be berxé min, destûr a te ye. Kember û mertal, şûr û kumzerxé min jî bi xwe re bibe. Pénc baré zéran jî li deveyan bike û bi xwe re bibe ji bavé xwe re.

Suhrab dest bi amadehîya çûndiné kir. Fesad û gelac zaf bûn, nûçe gihandin Efrasîyab, gotin Suhrab xwe hazir kiriye, komek leşker jî li xwe civandiye, wé biçe Irané. Welew héja zarok e jî, pélewanekî jéhatî ye, qala tîr û kevan, gurz û riman dike. Mér di ser pozé xwe re nabîne. Ji Keykawûs hez nake. Xortén Semenganî jé hez dikin û bawerî pé tînin.

Efrasîyab bi vé xeberé re keniya, şeytaniyek di seré wî re derbas dibû. Ji nav şervanén xwe komek pélewan bi taybetî bijart, Barman û Hûman jî kir fermandaré wan. Ji wan re wuha axifî:

-Ez dé niha gilî û nepenîyek ji we re bêjim, lê hûn ese ese ji devê xwe dernexin ha! Heta niha Ristemê Zal gelek pélewan ji me kuştine. Niha kuré wî li Semengané li cem diya xwe mezin bûye û heta niha bavé xwe

nedîtiye û ew nas jî nake. Ristem zane kurek wî heye, lé ew jî nizane ku mezin bûye û niha pélewan e. Suhrab ji Kawûs hez nake. Divé hûn nehélin ew bavé xwe nas bike. Qethen nehélin! Şere bav û kur! Hoy Rebbî! Kew li daré me ket! Suhrab cahil e, naşît e, xwîna wî dikele. Ji şere yek bi yek pir hez dike. E, hûn Ristem jî nas dikin jixwe. Ristem édî qert e û por spî kiriye, dibe ku Suhrab zora wî bibe. Bi vî awayî nîn be, em nikarin ji Ristemé Zal xelas bibin. Tené kuré wî encax ji heqqé wî deré! Piştî ku wî bavé xwe kuşt, dor wé were ser Suhrab jî. Ew jî li min! Ger hesabé me çep vegere û Ristem kuré xwe bikuje, ew dé bibe qatilé lawé xwe, rojek-du roj bi şûn de wé li vé yeké agahdar bibe, jixwe ew gav wé bikesire û ji qehra bimre. We fam kir? Mîna çeq û berké: kur jî bimre em li karé ne û bav jî bimre...

Du pélewané Tûranî, bi fermana Efrasîyab beré xwe dan Semengané cem Suhrab. Jé re gelek diyarî jî birin: barén bîst qantir û hespan tijî mucevher û xalîçe, textekî ji fîrûze, tacekî ji aqûd. Li ser tac durr hebûn û piyén text ji diranén fîl bûn. Nameyek wuha nivîsî bû Efrasîyab ji Suhrab re:

“Ger tu paytexta Irané bidestxînî, ez bawer im ku bi dadî û sazîya te wé hemî gel bigihîje aramî û rihetiyé. Semengan, Iran û Tûran hemî wek hev in. Çi cudahî di nava me de heye? Tu çiqas leşker ji min bixwazî, ez dé ji te re bişînim. Barman û Hûman wé her bi te re bin. Heta ku pédiviya te bi wan hebe, bila mévanén te bin.”

Dema ev kom gihîşt Semengané, Suhrab bi leq wan de çû. Kalé wî jî pé re. Hûman gava çav bi Suhrab ket, şaş ma.

186

Pélewanekî wuha bejndiréj û masûlkwerimî nedîtibû heta wé gavé. Silav û hurmetén Efrasîyab jé re pêşkêş kir. Suhrab gava nameyé xwend, bişirî. Ferman da, dengén defan bilind bû.

Çend roj bi şûn de, Suhrab berê artışa xwe da tuxubê Irané, ji tuxub buhurî û kîjan gund û bajar derket li pêş wî, hemiyan şewutand û xera kir. Tiştek li piya nehişt, hemî wêran kir. Hat ber bircekê, jé re digotin Birca Spî. Cîhekî asê bû û Iraniyan gelek bawerî bi wur dianî. Dîwarê qelê gelekî bilind û zexm bûn. Hêjîr fermandar û pêlewanê wé bircé bû. Hêjîr, ji ser banê qelê Suhrab û pélewanén din dît. Li hespé xwe suwar bû, berî ku ji qelê deré der, bang li leşkeren xwe kir:

- Wa ye pélewanek nézîk li me dike. Ela wî li pey e, ala Semengané bi wan re ye. Rabin, weke egît û mérxasan di ber xwe bidin.

Bîstké bi şûn de Suhrab li ber derî bû. Lé nihérîn, lé belé kesekî çok neçikand, nebizivî û newéribû here ser wî. Suhrab qérîn li wan kir:

-Lo lo, hûn reben in! Seroké we ji ruhê xwe dibuhure! Ka fermandarê we? Ew kî ye ji mala kî ye? Diya wî, wé li çoké xwe bixe!

Hêjîr bersiva wî da:

-Ez Hêjîr im, Hêjîrê Birca Spî me! Ez tené besî te me! Ger tu min nas nakî ji pélewanén Tûranî û Iranî bipirse. Ez dé seré te jêkim û ji Paşayê Semengané re bişînim û gewdé te jî bidim ber baz û qertelan.

Suhrab hesp ji cîh leqand, lé belé Hêjîr zanayé şer bû, xwe da aliyekî. Gava Suhrab li ba ket, wî rim avét û di pişta Suhrab de çikand. Lé belé seré rimé li zerx ket, li valahiyé çû, cané wî neêşand. Kuré Ristem ji pişta xwe ew rim derxist û ji Hêjîr re şand. Rim li sînga wî ket û ew di hespé de terrayî erdé kir. Hêjîr

bi rima xwe birîndar bû. Suhrab ajot ser, xwest serê wî jêke. Lê belê Hêjîr kir lave lav, xwe xiste bextê wî, jê tika kir ku ji jin û zarokên wî re ew

bibexşîne. Destê Suhrab neçû wî. Rabû dest û piyên wî girê da û ew şand cem Hûman, ew şev li wur, li nêzî Birca Spî kon vegirt. Dotira rojê gava tav derket, Tûraniyan kember girêdan û Suhrab jî bi wan re xwe avêt ser pişta hespê. Li nava qelê geriyan. Lê belê kesekî nedîtin, hemî pêlewan û leşkeren Hêjîr reviyabûn. Ew der viqî vala bûbû. Porspîyek wê qelê hebû, jê re digotin Gejdehemê Kal. Yekî dunyadîtî û pîr bû. Wî, hemî zarok û zêç, pîr û kal, bûk û jinebiyan bi xwe re biribû, ji Suhrab xelas kiribû.

Qîzek Gejdehemê Kal hebû, navê wê Gurdafrîd bû, ew jî li Qela Spî dima. Keçek şervan bû û nav û dengê wê li herêmê belav bûbû. Suhrab jî navê wê bihîstibû. Suhrab, bi taybetî çavê xwe li wê digerand, lê belê tu pêjn ji wê jî nedît.

Gejdehem, piştî ku ji Qela Spî direve, berê xwe dide bajarekî Iranê û li wur name ji Keykawûs re dişîne, dibê hal û mesele ev. Kawûs li ser wê rewşê diponije bi ser halê xwe de xemgîn dibe, hemî serbaz û fermandaran li hev dicivîne û nameye Gejdehem ji wan re eşkere dixweyne. Dû re jî wuha dibêje:

-^tên ku ew xortê Semenganî dike, navê wî Suhrab e, çi ye, êş û elema dilê me zêde dike. Gejdehem behsa wî dike, dibêje bobelatekî Xwedê ye. Ew dê serê me gelekî biêşîne. Ka bêjin, em çi bikin? Ka kî dikare li hember wî rabe? Di erda Iranê de pêlewan heye ku sîngê li ber wî biçikîne?

Mirovek li ser navê pêlewanên di civînê de wuha dibêje:

-Bila Gîw here cem Ristemê Zal, jê re vê yekê bêje. Bi wî bide fam kirin ku textê Şahê Iranê di xeterê de ye. Bila nesekine

û were. Ji bilî Ristemê Zabilî kî heye ku li dijî şervanekî wuha şûr li mertalan bixe?

Kawûs piştî vê gotinê serê xwe hejand û got:

-Min tenê bihêlin, ez dê biryarek bi tûnd bidim.

Şêwr û mişêwra giran bi katibê xwe re kir Kawûs. Gilîyekî di guhên wî de got. Katib rabû, nameyek wuha ji Ristem re nivîsî:

“Ristemê ezîz, Pêlewanê Cîhanê! Bila dilê te hertim ferah û ruhê te jî ronî be! Ez ji te ev dixwazim: pêlewanekî bi hêz û xwey artTş û çek ji alî Tûranê hatiye û niha ketiye axa Iranê, Birca Spî vala kiriye, leşkeren me dîl girtiye. Xortekî leheng û şerûd e; kesek pê nikare. Tenê baweriya me bi te heye, tenê tu dikarî serî li ber wî rakî. Ne ji te be, wê welatê me here helakê. Pêşiya gotiye; ji malê yekî qalê. Ne tu bî kesek di hewar û gaziya me de nayê. Hemî pêlewan li hêviya te ne. Yê ku Mazenderanê dagirker kir û zincîrên me qetand û yê ku Hamawêranê ser û binê hev kir tu bû yî! Ji hêza gurzê te roj digrî û heyv dişewute. Toza ku ji ber simên Rexşê Belek radibe, mîna mija adarê belav dibe. Kemenda te şêran girê dide û rima te çiyayan hildiweşîne. Di rojên reş de, tu sitara Iraniyan î. Pêlewanên me hemî bi te dipezinin. Pêlewan hemî civiyan û nameya ku ji Birca Spî, ji Gejdehem hatibû, xwendin. Biryar dan ku Gîw bişînin cem te. Ev name kengê û di kîja wextî de gihîşt destê te, ger şev be an jî roj be, nesekine û were vir. Ji kesekî re behsa vê bûyerê meke, bila veşartî bimîne çêtir e. Ger di dest te de qevdek gul jî hebe, bêhn meke û bi lez têkeve rê. Min bêriya dengê halanên te ku ji Zabilê li hemî dunyayê belav dibe kiriye.”

Keykawûs name da Gîw, got “Nesekine derê rê. Gava tu gihîştî mala Ristem, tu li wur ewle nebe. Xwe ne gewgirîne.

Heke tu bi şev bigihîjî wur, dotira rojê têkeve rê û vegere. Ji Ristem re bêje, ger ew neyê, ew dijminê Tûranî li ber çavê me biçûk nabe!”

Gîw berê xwe da mala xezûrê xwe. Ji mêj ve bû ku riya wî bi Qela Zabilê neketibû. Bi şev û roj, bêrawestin, nexwar û venexwar, li rê lezand. Li nêzîkî bajêr, nobedarê Qela Zabilê ew ji dûr ve dîtin, bang li berpirsiyaran

kirin: “Ji alî Iranê suwariyek pêlewan weke brûskê tê!” Ristem bi vî dengî re derket, çû pêşiya suwarî. Çend suwar jî dan dû. Ristem nihêrî ku yê ji wur ve tê, nebiyanî ye, lê mêrê xuşka wî ye. Lewma ji hespê xwe daket xwar. Li hal û ehwalê Şah pirsî. Kêfxweşî di hev dan û bi hev re çûn qesrê. Li wur, Gîw name da destê wî. Çi bihîstibû û çi hîn kiribû hemî jê re got. Ristem bi ba^şî lê guhdarî kir. Piştî ku nameyê xwend, gelekî şaş ma. Dû re jî keniya. Di ber xwe de hêdîka van bêjeyan mirmirand: “Gelo ew kî ye, ne Samê Duemîn be; dibe ku ew jî weke kalê min erd û ezman bihejîne! Ger ew ji Iranê an ji Zabilistanê bûna, ez lê şaş nedimam. Lê ji Tirkan yekî wuha? Ev dûrî eqle! Xeletiyek tê de heye! Ez difikirim, gelo ew ji malbata kî ye û ji nesla kî ye; lê belê ez dernaxim. Min bihîstiye ku ji qîza Padîşahê Semenganê ya ku wextakî ez pê re zewucîbûm kurek çê bûye. Lê ew hêja zarok e, ne çaxê wî yê pêlewaniyê ye. Ew ne zane şer çiye û ne jî zane meydana şer çewa ye. Min ji wê jina xwe ya kevn re mucevherat û diyariyan şandibû. Niwînerê ku çûbû, di vegerê de qala kurrê min kir. Got ew zarokek gelekî bejndirêj e, jêhatî ye û jîr e. Lê belê xortê ku tu behsa wî dikî, yekî mîna Hêjîrê Birca Spî dîl girtiye. Kurê min hêja hewqas mezin nîn e, ew dê nikaribe Hêjîr bigre û girê bide. Belê, ew kî ye?”

Çengelê pirsê di mêjiyê wî de, bi Gîw re çû seraya Zalê Zêrîn. Li wur mey vexwarin û kilam gotin. Bîstkê wusa mijûl bûn û henek kirin. Gîw devê xwe bir ber guhê Ristem:

-Destê min ji cıvata we nabe, lê hûn li min negrin, Kawûs got li Zabilê wext derbas neke, nesekine were. Ger ez dereng bimînim, ditirsim ku ceng dest pê bike. Pêdiviya wan gelekî bi min heye.

Ristem çeqilkêf bû, bi rihetî got:

-Na na! Qet meraq meke! Tu çima ditirsî? Bav û kalan gotine mirin heye xem tune ye! Ne wusa? Ka em îroj li kêfa xwe binêrin, Xwediyê sibehê Xwedayê şev û rojan e. Dev ji Kawûs jî û ji pêlewanên wî jî berde, li kêfa xwe binihêre lo! Lêvên xwe bi meyê şil bike! Em dê herin Iranê û bibin serokê wan. Bila berê felekê li me be, bes e! Gava Tirk ala min bibînin, ew agir bin jî li ber pêlên min nikarin rawestin. Dawet wê li wan bibe şîn.

Her du jî bi meyê sermest bûn; ji xwe ve çûn û ji dengbêjan re li çepikan xistin. Roja din jî hetanî êvarê vexwarin û bêhiş ketin. Gîw, vegera xwe ji bîr kir. Ristem bang li kevanîyan û qewraşan kir. Sifra xwarinê anîn. Piştî ş^ dîsa sitekanan li bin guhên hev xistin. Dû re Ristem rûd anî; hunermendan li rûdê xist û wî jî stran got. Dengê wan li kolanan belav bû. Ew roj jî wusa buhurî. Roja sêemîn jî, Keykawûs nehat eqlê wan. Roja çara, Gîw xwe ji vegerê re amade kir, berî li hespê suwarê got:

-Niha Kawûs hêrs bûye, mîna kûp nepixî ye! Ditirsim ku hiş jî li sera nemîne. Ew vê meselê gelekî girîng dibîne. Bi şev û roj, bi dilkeser û dilxetere ye, xew nakeve çavê wî, ked nakeve devê wî. Em di kêfê de, ew di dojehê de!

Ristem dîsa mîna berê got û wekiland:

-Na, na! Tiştân wuha nefıkire. Heqqê wî nîn e ji te bixeyide.

Seyîs Rexşr Belek anî, zîn li ser pişta wî danî. Piştre bi fermana Ristem borî lêketin. Suwariyên Zabilî bi vî dengî re rabûn. Hespan zîn kirin, şûr û mertalan hilanîn, zerx li xwe kirin. Zuware da prşî.

Gîw û Ristem berê xwe dan îranê, li nêzî paytextê, Tûs û Guhderz bi leq wan ve hatin û ew himêz kirin. Ji hespan daketin, peyatî pê re meşiyan û bi hev re hilkişiyan koşkê, cem Şah Kawûs. Li hember wî rêz bûn û hurmeta xwe jê re nîşandan, bejna xwe li ber wî tewandin. Lê belê Kawûs hêrs bûbû:

-Ristem pir qurre ye! Kes nikare pê re kapan bavêje! Lê hela bipirsin, ew kî ye? Hemwelatiyê min e û di bin fermana min de dijî.

Şah çav ji Gîw re şikand û ew tenha kir, gilîyekî di guhê wî de got:

-Ristem bixapîne û bibe cîhekî xelesemt, wî bi zindî daleqîne. Ji pêlewanan re bêje, bila carek din navê wî li cem min neynin zîmên.

Dilê Gîw ji vê xwesteka Şah şikest. Zavê Mala Zalê bû, xuşkek wî jî li cem Ristem bû. Qet bersiv neda Kawûs. Rû û sukûmê wî reş bû, eniya wî qumutî. Şahê Keyanî ew gav rewşa wî fam kir û li ber çavê hemî pêlewanan pê re hêrs bû. Mirovên serayê li hev nihêrîn, bi vê yekê şaş man. Şah bang li Tûs kir, jê re got "Bala te li Ristem û Gîw be! Gava te keys li wan anî, her du pêlewanan bigre û bavêje binê zîndanê." Tûs gava ji oda Kawûs derket, xwe gihand Ristem û bi milê wî girt. Lê belê kurê Zalê Zêrîn destê wî tan da û ew heliqand, xwe jê dûr xist. Piştre çû pehînek li derê oda Kawûs da û ket hundur. Dengê wî êlî bû û ji oda pêlewanan jî dihat bihîstin. Wuha digot:

192

-Giyayê hewşê tal e! Tu li dijî min jêhatî yî! Jixwe te heta niha tiştekî pak nekiriye! Ger tu hewqas mêr î, here wî pêlewanê Tirk yê ku Hêjîr dîl girtiye bigre û wî daleqîne. Hemî gelên Rûm, Seksar, Mazenderan, Misrê, Çîn û Hamawêranê fermandariya min qebûl kirine. Lê tu? Tu bi saya min li ser text î! Ne ji min bûna, tu dê dîl bimanayî di zîndana Mazenderanê de.

Kawûs tutişt negot, zimanê xwe xwar. Ristem ji hêrsa dilerizî; tavilê derket û derî li pey xwe bi şid lê da. Di şêmûka derî de, kulmek li pozê Tûs xist. Tûs li erdî pîj bû. Dev û pozê wî tijî xwîn bûn, Ristem pêl zikê wî kir û di ser re buhurî. Li ber derî xwe çengî ser pişta Rexş kir. "Deh" lê nekir, çimkî gelê îranê li wur civiyabû. A ku nedît, gotarek anî zimên:

-Gelê min yê ezîz! Heval û hogirên min! Min hetanî îroj bi qeweta milên xwe şer kir û padîşahan ji ser text anî xwarê. Min çi kir, bona gelê xwe û bona welatê îran û Nîvrojê kir. Lê mixabin îroj Kawûs xwest min dîl bigre. Kawûs kî ye li ber min? Tûs bi milê min girt. Tûsê reben û belengaz! Ne şah û ne jî art^ş ev hêz û qewet dane min. Zînê Rexşê Belek kursiyê min e, kumzerxê min jî tac e ji min re, gurzê kalanî gustîla pêçiya min e. Du tişt rêberên min in: dil û mil! Hew qas! Şewqa şûre birq, şeva tarî li ber min ronî dike. Azadiya min di destê kesekî de nîn e û ez ne koleyê kesekî me. Pêlewanan xwestin min bikin Şah; tac û text jî ji min re çêkirin. Lê belê çavê min di serokatiyê de nîn e. Ger min bixwesta, di dewsa Kawûs de ez dê rûniştama. Ez ji we dipirsim: min gotinên xerab û galgalên nexweş heq kiriye? Yê ku Keykûbad ji çiyê anî û ew derxist ser text kî ye? Ger Kûbad ji çiyê nehata, ne Kawûs dibû Şah û ne jî kesekî din. Ger ew pêlewanê Tûranî sibehê were vir; ew li mezin û biçûkan nanihêre, we hemiyan wê di bin şûr re derbas

bike. Hişâ xwe bidin serê xwe. Çareyek ji vê pirsgirêkê re bibinin. Ya na ez li Iranê namînim. Nivîna we wê bibe ax û teyrê sîsarik wê we bixwun.

Pişti axaftinê, Rexş rakir ser piya, ajot û çû. Pêlewan xemgîn bûn, Ristem serokê wan bû, çûndina wî şiş li kezeba wan xist. Civiyan û lijneyek şandin cem Guhderz, jê re gotin: “Tu destbirakê wî yî û hûn û Mala Zalê xinamiyê hev in. Ew te naşkîne. Pêşî here cem Şah, dilê wî xweş bike.”

Guhderz, digel Gîw û Gurgîn û Behram hilkişiyan serayê cem Keykawûs, jê re gotin:

-Ristem çi kiriye ku tu jê dixeyidî? Tu wuha bikî, Iran wê wêran bibe, li ber dest û piyan here. Te hay ji xwe nîn e. Te çi zû ji bîr kir; pêlewanê ku doh-pêr serê dêwan jêkir kî bû? Yê ku Hamawêranê wêran kir kî bû? Ristem çû, lê belê xêbetek giran bi ser me ve tê. Fermandarê wan mîna gur e.

Kesek xwe li ber wî gurî nagre. Di vê rewşa xerab de, kesê ku Ristem bixeyidîne, ew ehmeq e!

Şah ji vê gotinê tesîr girt, heq da wan:

-Gotina we rast e. Kesê ku Şah be, divê bi eql û îzan be. Ji hêrs û qahrê tiştek dernayê. Niha rabe, here cem Ristem, bi zarekî şêrîn dilê wî xweş bike, li ber bigere, hêvî têxe dilê wî. Ger tu ew bînî vir, dehî çêtir e.

Guhderz derket der, hemî serbaz û pêlewan jî li dû. Demek bi şûn de, hêja Ristem negihîştibû Zabilistanê, wan ew bi rê ve dît. Peznê wî dan:

-Hemî axa dunê li bin piyê te raxistiye. Textê Şehînşahiyê hertim cîhê te ye. Tu jî zanî, Kawûs mirovek bêmêjî ye. Gava hêrs dibe, çi tê ber deva dibêje, lê di demek kurt de jî kol poşman li ser dûva xwe rûdinê. Li xwe mukur tê. Ger tu jê ecz bûyî jî, ka çi sûcê gel heye? Tu çima ji welatê Iranê dixeyidî?

194

Şah poşman e, her roj pişta destê xwe gez dike. ^tê çû mede dû! Bila kîn û xerez nekeve dilê te. Gelê me li benda te ye.

Ristem gotina xwe kêm nehişt:

-Ez ji mirinê re hergav amade me. Pêdiviya min jî bi Kawûs nîn e. Ew li pêş çavê min dilopek av jî nîn e. Galgalên wî bê re bûn.

Guhderzî, xuyê Ristem baş zanî bû, gotinek bijart ku tan lê bikeve:

-Ger tu nezîvirî, wê bêjin Ristem ji wî pêlewanê Tirk tirsiya, lewma ji Iranê reviya. Bawerim ku gelê Iranê wê koçber bibe û bi rê keve, terkîwelat bibe. Hemîkes Kawûs sûcdar dike. Tewer qewraş û dergevan, niwîner û xizmetkar jî wî niheq dikin. Lê belê hemî ji Suhrab ditirsin. Gel di tengasiyê de ye, rûyê xwe ji wan nezîvirîne. Navê te yê pîroz bi hezkirina welêt ve

pelçîn bûye. Ger tu biçî Zabilê, ev navê te jî namîne. Bawer bike, rewşa leşkeran jî ne baş e. Roja ku Tûranî zora me bibin, dilê te jî wê bişkê, tu dê keserkûr bibî.

Ristem şaş me, li ser van gotinan fikirî û kûr çû. Kêliyekê xays ma. Got:

-Ger bi qasî misqalekê tirs di nava min de hebe, ez dê niha li pêş çavê we xwe bikujim. Tu jî zanî ku ez ji cengê narevim. Lê belê Şah rûmeta min binpê kir. Lê dîsa jî ez we naşkînim.

Ristemê Zal cardin vegeriya Iranê. Keykawûs gava ew dît, ji ser textê xwe rabû, sitûyê xwe li ber Pêlewanê Cîhanê xwar kir:

-Xwedanê şev û roj an mirov çawa xulk kiribe, mirov wulo ye. Ji roja ku navê Suhrab ketiye kerrika guhê min, goştê canê min roj bi roj dihele. Min çewtî kir, neheqî li te kir. Bona

şerâ Suhrab min bang li te kir. Ger min dilê te şikestibe, min bibexşîne.

Ristem lê vegerand:

-Ferman ya te ye! Rûyê erdê yê te ye. Va ye ez hatim! Hefteyek buhurî, fermandar û pêlewan li hev rûniştin. Gava roja zer perda qetranê çirand, Kawûs ferman da Gîw û Tûs, got defên cengê li ser pişta fîlan girêdin. Dû re deriyê gencînê da vekirin û zêr li leşker û pêlewanan belav kir. Sed hezar leşker civiya, rûyê erdê ji nalên hespan û ji simê fîlan cîte cîte bû. Ezman şîn bû, erd biriqî. Ji dengê defê ax hejiya, dûman ji ber piyên hespan rabû. Mij hetanî ber rojê belav bû. Cihêtiya nava şev û rojê nema. Ne ezman, ne stêrka Perwîn, ne kevir û ta’t, ne jî ax û av dixuya.

Êl û xêbet,

Bi tirs û heybet, meşiya, çû;

Zû û her zû,

Kawûs li pêş,

Pêlewanan da dû.

Gihîştin ber qelayekî. Keykawûs çadira xwe du mîl dûrî qelê vegirt, ala xwe li ber çikand. Pêlewanên din jî sîngên çadirên xwe kutan. Notirvanên li ser qelê artışa Iranê dîtin. Çûn, agahî dan Suhrab. Suhrab derket ser bircê, li artışa gelekî şên nihêrî. Hûman jî li rex wî bû, gava ev dîmen dît, axînek kûr, ji kezebê kişand. Suhrab dest danî ser milê wî, "Xem nîn e" got, "Çek û leşkeren wan gelek in, lê belê pêlewanekî xuyanî û berbiçav, yekî ku serî li ber min rake di nav wan de nîn e. Ez karim vê deştê bikim gola xwînê.

Suhrab ji ser bircê hat xwarê, bi xem û xetere ji meyger stekanek mey xwest. Dema tîrêjên rojê paş ve kişiyan, Ristem xwe amade kir û çû bin konê Şah, jê re wuha got:

-Ger destûra te hebe, ez dixwazim herim nava artışa Tûranîyan. Ez dê hîn bibim ka kîjan pêlewan li dora wî reqîbê min hene.

Kawûs li çi digeriya? Bi heyecan û dengekî lerzok got:

-Ha wusa! Ev tevger û terz yê te ye! Bila ruhê te ronî be. Ristem rabû, kincên Tirkan li xwe kir, mîna wan xwe girêda û çû, bi dizîka ket hundurê qelê. Nihêrî ku wa ye Tirk şarabê û qimiz veduxwun. Suhrab di navenda wan de cîh girtiye. Li aliyekî wî Jenderezmê kurê paşayê Semenganê, li alî din Hûman û li pişt wî mêrxasê bi nav û deng Barman heye. Suhrab ji hemiyan girtirîn e. Masûlkên milên wî mîna newqa hespê ye, sînga wî jî mîna sînga şêr e. Rûyê wî sorî kurr dike. Li rex wî sed leşker hene. Pêncî koleyên bi bazin li ber wî serê xwe tewandine. Ew gav, tiştekî ne di hesab de qewumî, Jenderezm Ristem dît ku li pişt sitûnekê wa ye mêze dike. Ji nav hevalên xwe rabû, hat ji Ristem pirsî:

-Tu kî yî? Ka were ber ronahiyê, ez rûyê te bibînim.

Ristem ji cîh ne libitî. Jenderezm bi milê wî girt, kurê Zal bi girtina mil herdem hêrs dibû, kulm li dev û pozê Jenderezm xist. Pêlewanê Semenganî di cîh de ket û bêhna wî çikiya.

Ristem ji wur derket û şopa xwe wunda kir. Suhrab li benda Jenderezm ma, lê ew nehat. Çend peyayan li dû wî şand, lê geriyan, lê belê ew nedîtin. Demek bi şûn de xebera nexêrê ji Suhrab re birin. Cesedê Jenderezm li bin sitûnekê dîtibûn. Suhrab pêlewanan li hev civand, ferman da:

-Bila îşev kesek ranezê. Xew ji me re heram e. Serê rimên xwe tûj bikin. Divê pirtîna baskê çivîkê jî we rake ser piyan.

Şeva ku çû, gurekî şivan û kûçikên me di şox û şengd de dît, lewma rrîşî kerî kir û xalê min kuşt.

Şev bû, Ristem vegeriya nav konên Iraniyan. Gîw li ber konan nobedar bû. Ew ji dûr ve dît û pirsî:

-Tu kî yî, di vê şeva zulûmat de ji ku derê tê yî?

-Ez Ristem im. Ji nava êla Tirkan têm. Min bi dizî raçaviya wan kir û bi wan veda weke mozê. Min pêlewanê Semenganî jî dît. Ez hatime vî temenî, min ji Tirkan kesekî wuha gir û çeleng heta niha nedîtibû. Ne di nav Iraniyan de û ne jî di nav Tûraniyan de kesekî wuha bejndirêj heye. Bi her hawê xwe, dişibe kalikê min Sam. Sam ji gorê rabûye û hatiye!

Roj bû sêla sor, rimên şewqa wê tûj bûn. Suhrab kincê cengê li xwe kir, yên rojane danî. Şûrê Hindê bi kêleka zîn ve hilawist, kumê paşayan da serê xwe. Kemenda ku ji çil helqeyî pêk dihat, bi terkiya hespê ve girêda. Hilkişiya cîhekî bilind, ser qotekî, bang li Hêjîrê ku ji Birca Spî ew hêsîr girtibû kir. Jê re wuha got:

-Ez dê niha çend pirsan li te bikim. Digel ku tu dîlê min î jî, ez dixwazim tu rast biaxifî. Ger tu jiyanek xweş bixwazî, ji min re vir û derewan meke.

Bersivên te heke ji dil û can bin, ez dê te bikim serbazê ad^ê. Ya na, gotinên te çewt derên, ez dê dest û piyên te cardin girêdim, bavêjim binê zîndanê.

Hêjîrê dîl lerizî, bû pile pila devê wî.

-Ji rastiyê baştirîn tiştek nîn e mîrê min, got.

Suhrab:

-Ez dê niha, di derheqa Şahê Iranê Kawûs û pêlewanên wî Gîw û Tûs, Guhderz û Behramê Hêç û xasma Ristemê Zal de pirsan ji te bikim. Tu divê çadirên wan yeko yeko şanî min bidî. Were em ji navendê dest pê bikin. Niha binihêre; wa ye li hember me konekî fireh vegirtî ye. Dora kon bi qumaşên

198

heftreng neqişandî ye. Wa ye çadirên ji çermê piling xuya dikin. Li pêşiyê sed fîlên hêç hene. Tu wî textê ji fîrûze û rengşîn dibînî? Ka li wê ala ji rengê binefşê binihêre; wa ye roj di navendê de ye û li ser rojê jî şik^ heyvê heye. Ew kesê ku li navenda wî konî rûniştiye, ew kî ye?

Hêjîr got:

-Ew Şahê Iranê Keykawûs e.

Suhrab pirsa duemîn jê kir:

-Ka îcar li alî rastê binihêre. Konê reş tu dibînî; li rex wî konî hesp û fîl hene. Li dor wî leşker û li pêş jî şêr cîh girtine. Wa ye kîs dixuyin, bawer im ew yên zêran in. Li ser ala wî şik^ fîl heye, ew konê kî ye gelo?

-Şik^ fîl li ser ala Tûs heye. Ew pêlewan kurê Newzerê Keyanî ye.

Suhrab li konekî sor nihêrî.

-Ew kon yê kî ye? Tu ala ku şik^ şêr li ser e dibînî? Leşker gelek li ber kon civiyane. Ew bi rim û zerx in. Navê wî pêlewanî çi ye? Derewan meke, rast bêje!

Hêjîr bi carekê re û bêşik got:

-Ew Guhderz e, kurê Geşwat e. Tevî Gîw, heyştê kurê wî

hene.

Pêlewanê Semenganî hêja xwesteka dilê xwe bincîh nekiribû. Pirsî:

-Ka îcar li wî konê kesk binihêre. Li ser ala ber kon şik^ ejderha heye. Leşker li ber derî ne. textek di navendê de heye, di şik^ stêrka Kawa de ye. Pêlewanekî gir û kincxweşik li ser text e. Rûniştiye, lê serê wî digihîje raserî kon. Ji giraniya wî, kursîyê bin wî buhustek di axê de çûye xwarê. Hespekî belek û piştsor wa ye li ber kon e. Kemend bi zîn ve ye, heta erdê dirêj e. Tu nabînî, wa ye dike hîre hîr, mîna deryayê dipijiqe. Li Iranê

ne kesekî wuha bejndirêj heye û ne jî hespekî wuha hêç! Ew kî ye?

Hêjîr bersiv neda, tev û lêvên wî li hev ketin, bû lepe lepa wî. Madê wî geh zer bû û geh sor. Nizanî bû çi bêje. Dudilî, li nav çavê Suhrab nihêrî. Nexwest ku bêje ew konê Ristemê Zal e. Jixwe hetanî wê gavê nizanî bû Suhrab lawê Ristem e. Wuha fikirî: “Ger ez bêjim Ristemê bi nav û deng ew e, dibe ku Suhrab ji nişka ve ên^ bike û zora wî bibe û ew bikuje. Wê gavê, Iran wê bê serpêlewan bimîne. A baş ew e ku, ez navê Ristem jê re nebêjim û kone wî nîşan nedim. De serîkî ye, di riya heqqiyê de ye. Suhrab min dikuje, dihêle ew zane...” Qilqilî û çavê wî vir de wê de reviyan. Hêdîka got:

-Ha ew? Ew, ew. Pêlewanekî biyanî ye. Xanedanê Çîn, ew ji Keykawûs re şandiye bo alîkariyê.

Suhrab fam kir ku Hêjîr tiştnan ji wî vedişêre. Hilmek kûr kişand, sînga xwe werimand, dîsa li çavê wî dîlî nihêrî, pirsî:

-Lawo, ez ji te navê wî dipirsim. Tu çi dibêjî? Hey virreko?

Hêjîr tirsiya, dîsa dev û diranên wî li hev ketin:

-Ez navê wî nizanim. Dema ew ji welatê Çînê hat cem Keykawûs, ez wê çaxê li Birca Spî bûm.

Dilê Suhrab ew gav kizirî û madê wî reş bû, qumutî. Wî heta wê gavê, bi hêviya ku leqay şopa bavê xwe bibe, konê wî bibîne pirsan ji Hêjîr kiribû, lê mixabin hêviya dilê wî tefiyabû. Diya wî Tehmîne Xanim, berî ku ew derê seferê, şikl û mşa^n bavê wî jê re gotibû. M^anên bavê xwe di wî "Pêlewanê Çînî" de dîtibû. Lê belê Hêjîr bav ji kur vedişart.

Suhrab, pêçiya xwe dirêjî alîkî din kir. Konekî xemilandî şanî wî da:

-Ka Hêjîr vê carê jî bêje: ew konê ku fîl û hesp li ber in, dengê boriyan jê tê, text di navendê de vegirtî ye û kole li hember sitûxwar in, ew yê kî ye?

-Yê Gîwê Guhderz e. Nîvê artışa Iranê di bin fermana wî de ye. Zavê Zal e, xuşka Ristem li bal e.

Qêrînek di dil û mêjiyê Suhrab de destpêkir: "Hewar e! Hewar e!" U dû re dengê diya wî hat ber guha: "Ez dê niha mohra bavê te bi milê te ve bikim. Mîna bazbendê ew bi xwe re bigerîne. Hetanî mirinê veşêre..." Ew gav destê xwe li ser hemayila milê xwe gerand. Dîsa bi biryar û rik lêgerîna bavê xwe domand, çavê xwe li ser çadiran gerand. Cardin pêçiya xwe dirêjî çadirek din kir:

-Ho Hêjîro! Ka binihêre. Li wî kone alî rojhilat fêr bibe. Wa ye hezar leşker li ber wur sef girtine. Hin ji wan bi rim in, hin jî bi şûr û mertal. Di nav de

textekî ji diranên fîl heye. Pêlewanê li ser jî tu dibînî? Koma koleyan jî li ser çokan rûniştî ne û sitûxwar in. Ew yê kî ye?

-Tu konê kurê Şah nîşanî min didî mîrê min! Navê wî Ferîburz e.

Hêviya wî netemirî bû. Di dilê wî de bi qasî serê derziyê hêviya dîtina bav hebûya, ew dê dîsa li pey biçûyana. Nîşanek, yek işaretek ji bavê. Gidî ji bo Xwedê, yek bêhnek. “Hey lo bavo, lo bavo! Ax lo bavo lo bavo!” Ev fîxana wî di dil de difetisî. Hêjîr ketibû rikê. Mîna ku heyfa xwe jê hiltanî. Nema xwe girt:

-Tu çima qet behsa Ristem nakî? Te navê hemiyan got, lê ka Ristemê Zal? Tu derewan ji min re dikî. Artışa Iranê bêyî Ristem naçe seferê. Di rojek wuha de ku Keykawûs jî hatiye li vir kon vegirtiye, derketiye meydana cengê, tu dibêjî Ristemê

Zal li mal maye! Di rojên wuha teng de, Pêlewanê Cîhanê divê li pêşiya leşkerên xwe bûya. Ristem mîrê te ye, ka ew li ku ye? Hêjîr got:

-Belê, mîrê min mîrê mîran e,

Ew pêlewan û nêçîrvan e,

Nêçîrvanê şêr û pilingan e,

Bi şev û roj li deşt û çiyan e,

Ez sond dixwum bi Rehman e,

Ew niha digere li Zabilistan e.

Niha rûniştiye li nav bostan e,

Ew mêrekî bi sed mêran e,

Nayê şere xişîm û cahilan e,

Vedixwe meyê, dikuje pezkûviyan e.

Suhrab:

-Ji çar aliyê dunê pêlewan hatina di hewar û gaziya Kawûs de. Tu hukmê min dibînî. Ji Çîn û Maçînê jî hatine. Çawa Ristem li Zabilê rûdinê şerabê veduxwe, an nêçîrê dike? Van virrên mezin meke lawo! Ez dê serê te jêkim, xwîna te bipijiqînim bi ser wan konan de. Ez soz didim te, ger tu Ristem şanî min bidî, ez dê şan û şerelT bidim te, devê gencîneya Semenganê ji te re vekim.

Hêjîr, weke dara hêjîrê ku bêar e, di zinar û lat û keviran de hêşîn dibe, dîsa ji gotina xwe nehat xwarê:

-Ew ne li vir e. Lê belê ger ez di dewsa te de bim, ez dê nexwazim ku li hember wî cengê bikim. Tê bêjî çima? Ew ne yekî ji yekan e, ew bi çiya û zinaran re cengê dike. Hemî serok û rêber hunerên wî dizanin. Tu jî pê nikarî.

Suhrab şaş ma, serê xwe hejand:

-Te kengê Ristem dît û tu çawa ew wuha ji nêz ve nas dikî û peznê wî didî?

Hêjîr deng nekir, wuha ponijî: “Ger ez niha şan û ŞÛMT wî xweşmêrî ji vî bêbav û bêînsafê Semenganî re bêjim, elametê wî eşkere bikim, gava Ristem bibîne, ew dê wî parçe parçe bike. Navmilê vî zalimî pan e, dest û lepên wî giran e, zîrek e, xwey eql û îzan e. Ger ew Ristem bike ji ruh û can e, Kawûs xwe li ber nagre, wê bireve ji Iran e.” Li xortê Semenganî li ba ket:

-Tu bo çi li pey Ristem digerî, qey tu li min maniya dikî ku min bikujî? Armanca te çi ye, eşkere bêje. Tu rêtina xwîna min dixwazî? Ristem bi hêsanî nekeve destê te.

Suhrab rûyê xwe veşart, histêrên çavê xwe bidizîka paqij kir. Hew xwe girt, bi hêz û zerpa di^ewatiyê bi pişta destê xwe sîleyek bihêz li Hêjîr xist. Hêjîr ji ber sîlê li hev zîzikî û ket xwarê. Suhrab vegeriya bin kon, taca zêrîn

ya kalê xwe ji serê xwe danî, kumzerxê cengê yê Rûman li ser pora xwe bincîh kir, zerx û keftan jî li bejna xwe kir. Rim û kevan, şûr û gurzê giran, ev hemû hilanî. Xwîna wî dikeliya; li hespekî Erebî suwar bû. Bi dengê borî û defdefkan derket meydana cengê, çû li hember Keykawûs rawesta. Pêlewanê Iranî ji ber wî xwe dan alî. Nikarî bûn li rûyê wî binihêrin. Bang li Kawûs kir:

-Ya Padîşahê gernas! Tu li meydana cengê li çi digerî? Tu li hember ŞTUDÜ dikarî bisekinî? Na. Belê, çima navê te Padîşah e? ew şeva ku Jenderezmê xalê min bi bêbextî hat kuştin, min sond xwar ku ez dê yek suwariyek li ser axa Iranê nehêlim û te jî bi zindî daleqînim. Pêlewanê te yê herî jêhatî kî ye, bila serê xwe ji min re derxîne?

Kesekî bersiv neda. Suhrab nihêrî kesek nabizive, wî bêdengiyê xera kir û xwe li ser PİŞWT xwar kir, hetanî tê de hebû rimekî heliqand nav konê Kawûs. Ji hukmê rima wî heftê sîngên

kon qetiyan. Kawûs hêrs bû: “Ka pêlewanên pîroz, mêrxas û egîtên axa Nîvroj? Lez bikin, agahî bigihînin Ristemê dilsoj! Ya na, ev Tirk, wê mêjiyê me hemiyan vala bike.” Ji kesekî deng derneket. Kawûs bi nalîn qêriya: “Xwelî li serê min be! Min jî digot pêlewanên min hene!”

Tûs xwe negirt, tavilê rabû û xwe gihand Ristemê Zal. Suwarê Rexşê Belek çok çikand, gîzma fenerî kişand lingên xwe, weke hercar zerx û zirîç hilanî, kum û kolos xwar kir dîsa. Mertala mifriq da ber xwe, xencera xerzanî xist ber kemberê, piştî ku xavê kemendê bi hespê ve girêda, gurzê kalanî ku not movik lê zêdebûn da ser zînê Entabî. Kembera Keyanî da pişta xwe. Gava li Rexşê Belek suwar bû, weke Sîpan hilkişe ser Girê Meleto. Ajot, bi ajotinek best. Lê belê şaş ma; “Hewqas amadehî bo çi?” Her wekî ku li dijî Ehrîmen dihat. Birayê xwe Zuware li bin konê xwe hişt bona li yên mayî miqate be.

Ristem, Suhrab li navenda şer dît, jê re wuha got:

-Ez naxwazim em li pêş çavê leşkeran şer bikin. Tu bi ya min bikî, were em herin çolekê, yek bi yek duello bikin û hêza hev û din biceribînin. Ne ji Iranê û ne jî ji Tûranê bila kesek li me temaşe neke. Bi tenê ez û tu! Ne kesek din!

Suhrab, li axaftina wî nihêrî, tiştek di dilê wî de libitî, lê mane nedayê. Bersiv da:

-Belê, em dê biçin cîhekî tenha. Tu ji niha ve baş bizanibe ku, tu di şer de nikarî bi min. Tu nikarî li ber kulmek min jî bisekinî. Bejn û bala te, zend û bendên te li cîh in, lê belê tu êdî extiyar î, tu pîr û kal î. Tu çima xwe dixî vî halî?

Ristem bi zarekî şêrîn li xortê hember xwe kir gazî:

-Lawo, tu xort î û nuhciwanî, egît î, mêrxas î, lê belê tu nezanî. Naşîtî, tu hêja nepêlewan î. Erd hişk û sar e, bin axê bi

204

kurmik û kêzik û mar e. Lê belê hewa germ û nerm e. Hetanî vî temenî, ez gelek caran derketim meydana cengê. Min gelek ba û bahoz derbas kir, gelek ar^ş ji hev pelişand. Dêwan kir zare zar, lê ez tucar binketî nebûm. Tu biçûk î, hêja bêhna şîr ji devê te tê. Tu dê bigirînî bi ser diya xwe ve vegerî. Ez qert im û kal im, lê belê ez di şer de ji te re ne heval im. Ger tu ruhê xwe ji destê min xelas bikî, bizanibe ku êdî mirin ji te re nîn e. Bipirse ji çiya û geliyan, wê ji te re bêjin şer û cengên min. Stêrik şahid in; rûyê dunê li bin piyê min xalîçe ye. Gunehê min bi te tê, dilê min dişewute berxê min, ez nizanim çima. Tu di temenê kurê min de yî, ez naxwazim dest li ber te rakim, te bikujim. Dilê min dikizire! Tu ter û teze

yî, simbêlên te hêja nuh xwêdan didin. Ez dêna xwe didim te, tu naşibî Tirkan. Bi Xwedê tu ji wan re nabî heval.

Piştî van galgalan, dilê Suhrab jî keliya. Pêjna hisên diltepînî tê de şîyar bû. Dîsa gotinên diya xwe dibîranî. Wuha got:

-Ez dê yek pirsek ji te bikim xalo. Ji kerema xwe re bêje ji min re, bav û kalên te kî ne? Qala malbata xwe bike. Texmîna min ev e ku, Ristemê Zabilê, torinê Sam tu yî.

Ristem rawesta, kêliyekê bêdeng ma. Mat û xayis çû. Fikirî; nexwest xwe bi pêlewanê xort bide nasîn. Seba ku, ger di şer de têk biçûya, Iranî dê bikaribûna nasnama wî veşartana. Di dilê xwe de got "Bila Tirk nebêjin naşîtekî Ristem bindest

xist." Serê xwe hejand, çena xwe bilind kir:

-Na xwarzîkê min! Ez li ku, Ristemê Zal li ku? ew pêlewanekî mezin e, bi nav û deng e. Lê ez? Kal im, bêhalim. Ez rebenê Xwedê, ku dera min dişibe Ristem? Ne taca min heye, ne text û seraya min... Yekî mîna Ristemê Zal, tenezûlî xwe dike ku bi zarok û naşîtekî mîna te re derkeve meydana cengê?

Fikr û ramanên têkel di hışe Suhrab de geriyan, bi destê çepê çermê eniya xwe kaş kir. M^anên ku diya wî di derheqa Ristem de gotibûn, têra nasînê nedikirin. Demek kurt rawesta, dîsa li Ristem nihêrî. Hindik mabû ku bêje "Xalo, bêhna bavê min ji te tê!"

Rahişt rima xwe û çû.

Cîhê ku tenha bû, xelesemt bû ku bona şer bijartibûn, cîhekî teng bû. Lewma bi rimên destîkurt, dest bi şer kirin. Hetanî darên rima şikest û hesinê serê wan weşiya. Dû re hespên xwe li alî çepê zîvirandin û şûran Hindê kişandin. Her du tenê bûn. Li cîhekî xir û xalî. Bav û kur. Ji xwîna hev. Parçeyek ji kezeba hev. Bi hêrs û best, bêsekin û tebat, çavsor û

dilxezeb, bi rik û xerez şûr davêtin hev. Dengê dê, di dilê Suhrab de êdî nedipijkuvî. Şingîna şûran ku olan dida, dengê teyr û turûdan û hemî rawurên çolê û digel dengê hemî xwezayê birrî. Zimanê her giyandarî jêkir, guhên wan kher kir. Gava şûr li hev diketin, çirûskên agir bi erdê dixist. Bav û kur zora hev nebirin. Li hev û din xistin hetanî şûran destên wan kol bûn, qevdika şûran sincirî û şikestin. Paşê rim jî parçe bûn, lê belê ew di hev de ko nebûn û nebetilîn. Rahiştin gurzên giran, ên^ kirin, mîna ku dijminên kevn bûn, neyarên ji bav û kalan. Kêliya gurz li hev diketin, gurmîn diket meydanê û erd dihejiya, terk li axê diketin. Her dû jî bêdeng bûn. Cara yekemîn bû ku Ristem di cengek wuha dijwar de halan di xwe nedida. Gurz giran bûn, qevda destê wan diêşandin. Xwîn ji nav pêçiyên wan herikî. Gurz jî di hev de ditewiyan. “Hewar e, hezar carî hewar e! Bila kula Xwedê sê kul be, bi ser Efrasîyab û Kawûs ve bibare, ku çawa bav û kur îroj ji hev re kirine dijmin û neyare!” Ev dengê Tehmîne, ger niha ew li wur bûna, wê li dilê bav û law tesîr bikirana. Mixabin ji Semenganê heta wur deng nedihat! Mîna

206

ku kesên biyanî bav û kur bêhiş xistibûn, wan weke boxên ku êri^î cawê sor bike, berra ser hev dabûn. Mîna beranan hirrî hev dikirin. Xwediyê wan, li bin konan di kêfa xwe de bûn, ling avêtibûn ser hev. Li hev xistin; ew ranewestiyan, lê belê hespên bin wan êdî dilikumîn. Zerxên her du pêlewanan wesle wesle weşiyan erdê. Dest û piyên wan werimîn, bêlebat, her du jî ji hayho de ketin. Yek ji ber yê din nereviya, yek ji ber yekî negot el-eman û serî netewand. Di gola xwêdan û xwînê de man. Dev û pozê wan tijî ax bû. Tî bûn, ji tîna devê wan miçiqî, xwîn di zimanê wan re avêt. Bav, bi dilekî keserkûr, law jî westiyayî ji hev dûr ketin. Di dil û mêjiyan de ne hezkirin û ne jî merhamet û diltepînî mabû. Xwîn, xwîn

û xwîn! Ev xwesteka di dilê wan de, di damarên spîçka çavan de xwe nîşan dida.

“Tîmseh jî mîna vî xortî nikare êri^ bike!” Gotina pêşî ya Ristem ku gava vegeriya bin kon ev bû. “Di şerâ Dêwê Spî de jî hewqas newestiyabûm û çavtirsandî nebûbûm. Bi rastî, li hember vî xortê naşît, vî xişîmê nenas, ez ji lepkut ketim.”

Kawûs, li bin kon li rewşa pêlewanê xwe nihêrî, bi halê wî yê xerab knxweş bû, lê belê di rûyê xwe de eşkere nekir. Bi tenê destê xwe di hev de mizda: “Roja Ristem hat, ez dê ji bela wî xelas bibim.”

Roja man û nemanê bû, riya çûndin, lê nehatê bû! Yek ji wan wê bihata kuştin. Kuştinek mêranî, di şerekî yek bi yek de. Tirs tune bû, ji ser vê riyê veger jî nedibû. Tîr ji kevanê pekiyabû êdî. Ji her du egîtan wê diya kî bigiriyana" Kî ji wan bihata kuştin, wê yê din li ser bigiriyana. Ango diya herduyan wê bigirîyana. Têkçûn û serketin, van bêjeyan bo bav û kur bûn. Lê belê serketin nîn bû, her têkçûn bûbû para wan. Ristem çi digot berê: Felek li pişta min be bes e, min tiştekî din navê. Lê

vêcarê felek li wan çep geriyabû. Feleka xayin... Pişta wan ne li felekê, berê wan jî êdî ne li oxirê bû.

Hespên bin wan rawestiyabûn. Cara duwem, dîsa bi rik û xerez derketin hember hev. Vêcarê tîr avêtin hev, mîna zîpikê bi ser hev û din de barandin. Çok dabûn erdê, kevanê heta ber pozê xwe bilind dikirin û darikê pozhesinî berra hev didan. Demek wuha sihêtiya hev kirin. Zerxê ser Ristem parçe parçe bûbû, zîval zîvalî, li erdê belav bûbû. Kincê wî jî wulo. Sînga wî ya sorî kur, pêsîrên xurt û werimî, masûlkên hişkê mîna hêta devê derketibûn holê. Suhrab jî bêzerx bû, kinc li ser wî jî nema bûn. Digel vê rewşê, her du pêlewanan xwe ji ber tîran nedidan alî. Gav û seat buhurîn, her du jî di hev de kerixîn û ko bûn mîna şûran destê xwe.

Hevesa cengê di dilê wan de temirî. Hespan li aliyekî hiştibûn. Vêcarê haletê cengê jî dan alî din. Bi hirê fêris û pêlewanan, bi quloçşikestina beranan çûne hav. Di vî şera dirinde de, rahiştin kembera hev û din. Pêşî, Ristem bi kembera Suhrab girt û ew li erdê xist, lê belê Suhrabê çeleng zûka rabû piya, xwe da aliyekî din, kember ji destê wî xelas kir. Ristem şaş ma; pişta Suhrab zexm bû û bihêz bû. Ji hev dûr ketin. Suhrab xwe gihand hespê xwe û gurzê bi zîn ve hilawestî bû anî xwar. Hat, bi wî gurzî ve li ser milê Ristem xist. Êşê xwe berra kezeba kurê Zalê da. Lê belê diranê xwe şidand ser hev, êşê di nava xwe de veşart, qet deng nekir. Suhrab bang lê kir:

-Lo lo suwaro! Ker jî ji wî hespê te çêtir e. Pîr û kokimekî mîna te, bi hespekî zexel wê çawa li hember xortekî mîna min di ber xwe bide?

Êşa sermil, nehişt Ristem bersiva wî bide. Piştî ku her du di hev de kol bûn û bêzar ketin, Ristem berê hespê xwe da nav konên Tûraniyan. Suhrab jî dizgîna hespê xwe serbest berda û

208

xwe li nav îraniyan xist. Gelek pêlewanê Îranî kuşt, gelekan jî birîndar hişt. Ristem ev rewş dît, gelekî ecz bû. Kete xeterê; ditirsiya ku Suhrab xwe bigihîne konê Şah û ew der jî wêran bike, Kawûs bikuje. Lewma, zûka vegeriya berê xwe da bin konê xwe, lê belê bi rê ve Suhrab dît; serê rima wî bi xwîn bû û dest û kincên wî jî wusa. Hema bi ser ve qêriya:

-Hey Tirkê xwînxwar! îraniyan heta niha çi xerabî û dijminî li te kirin ku tu niha bi kîn û buxd wuha êri^î wan dikî?

-Ewul te ên^î Tûraniyan kir, ne ez!

Ristem:

-Niha tu jî dibînî ku tariya şevê bi ser me ve hat. Êdî ne wextê şer e. Sibehê, em dê şûran xwe, bi şûran tîrêjên rojê re biçikînin li erdê. Ew gav li vê meydanê, wê him textê pederçahiyê were vegirtin, hem jî dara sêpê! Dunya, dunyayek derewîne, tenê li ber hukmê şûr serî ditewîne... Tu mêrxasî, canê te ji şûr û rim û tîran re perwerde ye. Xwarzê! Hêja bêhna şîr ji devê te tê, tu ji leystika kolanan têr nebûyî. Em dê îşev bizîvirin bin konan, sibeh tê xêr jî pê re, ka hela felek wê bi kî ji me re bikene?

Tarî hukmê xwe da nîşandan, ew ji hev cihê bûn.

Gava Suhrab gihîşt bin çadira xwe, bang li Hûman kir:

-Ev pêlewanê destşêr û navmilpan kî ye gelo? Ew nijdevan, dema ên^î nava we kir, çi got û çi kir? Min kesekî bi ecêba wî nedît! Zilamekî pîr û kal e, lê hêja egît e, qehreman e, ne ji şer radiweste û ne jî dibe bêzar e.

Hûman got:

-Çi ji destê me tê? Gava ên^ kir, dîsa zerar û ziyan da me. Lê belê em li gor fermana paşa tevdigerin, lewma em nereviyan. Mîna serxweşan ket nava me. Gelek leşkeran me kuşt.

Suhrab:

-Ez dê heyfa wan sibehê hilînim! Miraqan nekin. Sibehê wê rojek bi nîşan be. Gur û rovî wê eşkere bibin. Kî tajî ye û kî şrr e, wê bê dîtin. Ez Suhrabê Semenganî me, bi sond û peyman, ez dê yek ji wan nehêlim.

Ji alî din ve, Ristem li rewşa hevalên xwe pirsî. Bang li Gîw kir:

-Ka bêje, dawiya vî şerî wê çawa be? Bi dîtina te, Suhrab bi çi teher û terzê cengê dike?

Gîw got:

-Heta niha, me yekî mîna wî nedîtiye. Divê mirov mêran bikuje jî, lê heqqê wan wunda meke. Mêrik mêr e û mêr di ser pozê xwe re nabîne. Gava

êri^î nava konên me kir, berê xwe da Tûs. Tûs li bin çadirê dirêjkirî bû. Çav pê ket ku Suhrab weke gur tê, ji cîh hilqevizî û xwe çengî ser hespê kir. Lê belê fersend nedît. Suhrab gurz li sînga wî xist. Kumê Tûs ji sera ket û dû re reviya. Tu jî dizanî ku urf û adetên me Iraniyan hene; em tucarî xêbetên xwe ji xelkê re nahêlin û narevin. Ew gav kesekî li hember wî derneket û nebizivî. Ew jî nesekinî, hespê xwe ajot û

çû.

Ristem berê xwe da bin konê Keykawûs. Jê re qala Suhrab kir:

-Sakûlê doh, emana me bir. Hêz û çelengiya wî dûrî eql û îzan e. Bejndirêj e, serê wî digihîje nav ewran. Di bin giraniya gewdê wî de ax jî dinale. Mil û ranên wî, hêtên devê ne. Li wî cîhê xelesemt, me bi rim û şûran li hev xist. Dû re me tîr weşand ser hev. Min carek tenê keys lê anî, bi kembera wî girt, lê wî xwe zûka xelas kir. Gûzeke hişk e, tê zanîn. Tariya şevê şer betal kir. Sibehê, Xwedê bide kî, ew e serpêlewan.

Şah bi vaqûrî, qirika xwe qalind kir, xebxebê nîşan da û çavê xwe kuskusand. Di rûyê wî de dixuya ku, tiştek di dilê xwe de vedişart. Sira dilê xwe bi vî awayî bindoşek kir:

-Ristemo! Tu lawê min î. Ez dê heta sibehê îşev ji te re dua bikim. Li hember wî Tirkê bêbav û zalim, ji bo ku tu xalib werî, ez dê hêvî û tika ji Xwedanê şev û rojan, ji Hurmuzê Pîroz bikim.

Ristem hat bin konê xwe, Zuware yê birayê wî, ew ziyaret kir, li hal û wextê wî, li rewş û tendurustiya wî pirsî. Pêlewanê Cîhanê wuha got ji birê xwe re:

-Şiyar be, gelekî şiyar. Te hay ji pêlewanan hebe û qet nekeve te^ê. Sibehê gava ez çûm şere wî Tirkî, Tu jî artışa me ya Zabilê amade bike. Ala min, text û pêlavên zêrkirî bîne. Bi tîrêjên rojê re, li ber kon amade be.

Ger ez bi serketin vî şerî xelas bikim, jixwe li meydana şer nasekinim. Lê belê heke ez bindest bikevim û têk herim, şîreta min li te tu megrî û qet menale! Eniya xwe jî neqermiçîne. Piştî kuştina min, wesyeta min li we, bila kesek li dijî wî Tirkê pêlewan derneyê. Berê xwe bidin Zabilistanê, biçin cem Zalê Zêrîn, Destanê kal. Jê re bêjin, xem nîn e bavo, Ristem bi destê mirovekî pîsik û belengaz nemir, ew bi destê mêrxasekî hat kuştin. Kuştin riya mêran e, Ristem cêrê avê bû, li riya kaniyê şikest. Bêje bavo Ristem wesyet kiriye, gotiye bila bavê min bi gotina Keykawûs neke, ew niha li pey dek û dolaban e û darê xwe ji serê Zal re dixeritîne. Tiştekî xerab di dilê wî de heye, lê çi ye, ew eşkere nake. Piştre here cem diya me Rûdabe, li ber çokên wê rûnê, nehêle ew bigrî û bilorîne. Bêje dayê, şî^ li ser Ristem girê nede. Jixwe Ristem berxê nêr bû, lewma ji kêrê re bû û hat serjêkirin. Bêje dayê, tu diya egît û fêrisan î, bila kesek nebêje min weke te beran û hogiç anî.

Birayê min î şîrhelal! Gelek dêw û şâr, piling û ejder di nava pençên min de can dan. Min gelek qela û birç, qesr û qonax kambax kir û wêran hişt. Hetanî niha kesekî milê min dananî. Şervan û suwarê ku pê bixe zengûyê, zû an dereng, ew dê mitleq were kuştin. Cemşîd û Nerîman bîne bîhra xwe. Ka dunya ji wan re ma?

Sibeh hat, şewqa sor kum û kolosê xwe ji pişt giran deranî, basikên qertela reş ya şevê ku bi ser dunê ve vegirtibû civîya û qertel firiya, wunda bû. Ristemê Zal, lehengê qela Zabilê, Pêlewanê Cîhanê, terhika welatê xwe, welatê Nîvrojê rabû, pêşî zerxê xwe yê ji çermê bebir li xwe kir. Çû cem Rexşê Belek, lê belê hespê wî hêç bûbû, vir de wê de ditirisand. Li ber geriya, ew haş kir û lê suwar bû. Haletên cengê hilanî û derket meydanê. Her du adTş, li hember hev bûn, rim di dest leşkeran de bû. Lê belê bêdeng bûn. Di sibehek wuha şilfî tazî, aram û sar de li benda her du pêlewanan bûn.

Li milê din, Suhrab heta wê gavê di zewq û sefayê de wext derbas kiribû. Hêja jî şerab vedixwar, dengê rûdê ji bin çadira wî dihat. Bi xêfî, li ber guhê Hûman wuha got:

-Reqîbê min qert e û porspî ye. Ez dê bi vî halî jî pê karibim. Lê belê ew bi qasî min dirêj e, navmilpan e. ez hîç jê natirsim. Ew gelekî dişibe min; bi sîng û navmil, çav û birû, reng û rû. Gava ez li pê û çokên wî dinihêrim, şifqet û merhametek bêhempa di dilê min de vedije, ez nizanim çima. Tu bawer nakî, lê ez dê tiştekî ji te re bêjim: ez ji wî fedî dikim. Weke mirov bi bavê xwe re cengê bike! An bi diya xwe re zinê! Rûyê min sor dibe, reş dibe. Ez nîşa^ bavê xwe di wî pêlewanî de dibînim. Dilê min lewma dipirpite û dikizire.

Hûmano! Bimeyzîne, baş guh li min bidêre,

Neyarê min ne ditirse, ne dilerze, weke şêr e,

Çavronî ye, mêjîpak e, dilê wî jî weke zêr e,

Li meydanê egît e, bi Xwedê ew pir bikêr e.

Ez poşman im ji xwîna vî şerî, dilê min pir zîz e,

Ew ne dijmin e, ji malê ye, xwî^êrîn e dilezîz e,

Em betilîn, hesp betilîn, çirûskên şûr wîze wîze,

Ez bi rik im, lê bi şik im: Efrasîyab bi me dileyîze.

Guman dikim; ew Ristemê Zal e , bavê min e,

Ne bi xerez e, ne bi kîn e, ne neyar û dijmin e,

Ger mirim, hûn’ê bêjin ew mêr e, lê emir kin e,

Ristem bimre, hûn’ê bêjin ji me re qet reqîp tune...

Hûman di cîh de cemidî. Dû re qilqilî. Weke dizekî ku malê diziyê di tûrikê wî de were dîtin, fedî kir û xwêdan da. Lê belê bersiva xwe mîna di ser tiştekî de bişofîne da:

-Tu zanî ku ez çend caran li Ristem rast hatime? Te nebihîst ku wî li Mazenderanê çi hukum kir? Ew hewqas ne yekî biçûk e ku were li dijî te şer bike!

Leşker û pêlewanên Tûranî û Semenganî ji xew şîyar bûn. Dilê Suhrab ji kêfê û vexwarinê têr nebûbû. Ji cengê jî nereviya, wêrekiya serxweşiyê jî lê tesîr dikir. Kincê cengê li xwe kir, berî derkeve meydana halan di xwe da. Bi vî dengî re Tirk lerizîn, cesaret hat wan. Lê belê Ristem tiştekî ecêb, maneyek eletewş li ser rûyê wî dît: dikeniya û serê xwe dihejand. Li halê Ristem pirsî û pê re bi dilekî germ û nerm, weke hevalekî axifî:

-Tu têr razayî? Çima xwesteka şer û duelloyê li te bûye rik û inyad? Niha em dev ji hev berdin dehî ne çêtir e? Tîra

tolhildanê bişkâne, gürz û rim û kevanê bavêje erdê. Tu dil bikî, were em ji ser zîn dakevin û li cem hev û din rûnên. Rû û rûçikên me yên ku bi kîn û xerezê qermiçîne û di xwêdan û xwînê de gemirîne, em bi şerabê bişonin, gilî û gazincên xwe li hev bikin. Dilê xwe xweş û şa bikin. Ev şerekî bêwate ye, nirxê xwe nîn e. Were em li ber destê Ruhê Hurmuz tobe bikin û sond bixwun ji hev re bo careke din şer û pevçûnê nekin. Dibe ku tu bawer nekî, lê gava ku cara yekemîn ez çav bi te ketim, hezkirinek ji kûraniya dilê min bijkuvî. Ez jî nizanim çima! Xalo! Rûyê min ji fediyê sor dibe. Ka ji min re bêje, di malbata te de kîjan pêlewan hene? Esl û feslê xwe ji min re rêz û bêz bike. Min navê te ji gelek pêlewanan pirsî, lê mixabin kesekî ji min re negot. Ez tika dikim, xwe bi min bide nasîn. Tu reqîbê min î, lê xwe vedişêrî! Ma ev tiştekî rast e? Tu neviyê Sam nîn î? Ristem heye, ji Zabilê ye. Ew ne tu yî?

Ristem di dilê xwe de got “Vî zarokî dixwaze min bixapîne”. Paşê bi dilekî reş û bibiryar lê vegerand:

-Lo xorto! Xortê xişîm û nezan! Tu li pey nav û dengê dunê yî? Tu çima van pirsan ji min dikî? Te peymana me ya doh ji bîr kir? Me ji bona şer biryar girtibû. Neyê bîra te? Tu bi van galgalan nikarî min bixapînî. Min kembera cengê li nava xwe pêça. Ez wê ji pişta xwe venakim êdî. Were em dîsa rahijin hev, ka hela Xwedanê şev û rojan wê bide kî ji me! Xwarzê, min vî porî li ber tavê spî nekiriye, min hetanî niha gelek fen û fît dîtine, serê min ketine gelek dafikan. Ez zû bi zû naxapim.

Suhrab li ber geriya:

-Xalo,tu êdî pîr û kal î, were guh bidêre. Ez dixwazim tu di nava doşek û lihêfa germ û nerm de, li mala xwe, di nava zarûzêçên xwe de, bi dilekî aram bimrî. Ne di nava gola xwînê de, ne di kefteleftek wuha de. Ev şere dirinde bi te nakeve xalo.

214

Lê belê ger, di qedera te de ruhstênê te ez bim, ez ji vê yekê jî narevim û texsîr nakim, ez dikarim wê wezîfê jî bincîh bînim.

Her du ji ser hespan daketin xwarê. Sîngên xwe vekêşandin, serê xwe bilind kirin, bi hefsarên hespan girtin û birin bi zinaran ve girêdan. Di vegerê de li nava çavên hev nihêrîn, reşika çavên wan di nava birûyan de wunda bûn. Eniyek paqij, nihêrînek bi rûmet... Her du awur ji hev neneqandin. Mirin, mirin, mirin. Mirin li çokê, mirin di gewriyê de. Na, mirin di çavên zer de. Mirin di nava xwînê de. Dibe ku di navenda mêjî de.

Bi dilxemî destpêkirin.

Suhrab mîna şêrekî ku erna wî rabûbe, ji cîh xwe hilavêt û mîna fîlekî serxweş bi kembera Ristem girt û bi zerp kişand. Halan da xwe “ez im Suhrabê Semenganî” û bi hêrs derb lê xist. Ristemê Qelafetfîl li erdê dirêj kir. Piştre, carek din ew ji ser axê rakir, hêja hiş nehatibû serê Ristem, ew bilind kir û li erdê xist. Dev û pozê pêlewanê qert di axê de lewutî. Lê di ber xwe da. Bi şewuşîn rabû piya û bi ser Suhrab ve çû. Lê belê, wî fersend neda, rahişt Ristem û ew zîzikand, tavilê jî li ser sînga wî rûnişt. Xencera di rengê avê de, ji ber xwe deranî, da ser qirika Ristem. Xwest wî serjê bike bi pezikî. Ew gav Ristem di dilê xwe de got “icar wext hat! Divê ez sira dilê xwe eşkere bikim.” Ji pêlewanê ser xwe re wuha got:

-Ya pêlewanê pispor û jêhatî! Tu ji şûr ^andinê re û ji şere gurz û kemend avêtinê re jî hoste yî. Urf û adet û toreyên me ne mîna yên we ne. Em iranî û Zabilî, gava pişta pêlewanekî mêrxas didin erdê, ew digel ku dijmin e jî, em cara yekem serê wî jê nakin û wî nakujin. Li cem me, qewlê nebî du car in. ger em cara duemîn jî reqîbê xwe bavêjin erdê, ew gav qetla wî helal e. Banekên me ev in.

Piştî vê gotinê, Suhrab xencer ji ber qirika Ristem kişand û ji ser sînga wî rabû. Suwarê Rexşr Belek, bi vî awayî dek lê çêkir û xwe ji destê wî xelas kir. An jî li gorî gotinên gotinbêjan û rîwayetan, destê Suhrab neçû wî, nexwest ew bikuje, heyfa wî lê hat. Dilê wî debar neda.

Suhrab rabû piya, bi serkeftinî nefesek kûr kişand û li dor xwe meyzand. Kesek tunebû. Ristemê Zal di wî halî de, li wur hişt û berê xwe da beriyê. Hefsarê hespê xwe bi ser karxezalan ve sist kir. Xezalan çindik dida xwe û dibeziyan. Pezkuvîyan quloç di hev didan. Ew roj hetanî êvarê, wexta xwe bi seyda wan xezalan derbas kir. Wan bi kemendê ve girê da. Şer û pevçûna doh û pêr ji bîr kir.

Şev hat, xetere jî pê re. Gotin û galgala şêwir û mişêwrê giran di bin konan de destpêkir. Porspî û jîrik li hev rûniştin. Hûman ji Suhrab rewşa şer pirsî. Tevgera Ristemê Zal çawa bû, dixwest hîn bike.

Kurê Tehmîne got:

-Min doh keys lê anîbû, lê belê min wî da xatirê urf û adetên Iranê.

Hûman qaherî û careke din ew ji şer re sîqiland û wî li Ristem sor kir:

-Xwelî li serê te be! Ji bejn û bala xwe, ju sîng û ranên xwe fedî bike. Hey malneketo! Te bi destê xwe, şêrê di dafikê de serbest berdaye. Dunya keys û fesal e dîniko. Weyla weyla! Bi rastî jî tu xişîm î ha! Ez ditirsim ku buhayê vê çewtiyê wê gelekî giran be. Belê, destê min li ser dilê min e, Ristem keysfileh e. Ger tu têkevî kemîna wî, bi sonda mezin ew te efû nake û av jî di ser te re venaxwe. Paşayekî wuha gotibû: dijminê li hember xwe tucarî biçûk nebînin.

216

Suhrab mebesta wî fam kir, lewma bi dilekî paqij got:

-Bes e bes! Êdî van xem û fikarên kambax, van ramanên kirêt û têkel ji dilê xwe bavêje. Gava ew sibehê were li dijî min raweste, wê çaxê ez mecbûr im dirinde bim. Tu dê bibînî li ber çavê xwe ku zincîr û qeydên hêsîriyê çawa dixim sitûyê wî!

Suhrab xemgîn bû, di bin bandora pevçûnê de bû. Lezand, xwe ji Hûman dûr xist û çû bin konê xwe.

Ji alî din ve Ristem, piştî ku ji wê talûkê, ji hafa mirinê xelas bû, bêhna xwe da, li xwe nihêrî, gazî hekîman kir, tendurustiya xwe di bin çav de derbas kir, arîşeniya xwe li hev rast kir. Di demek kurt de bû weke çiya;

gelekî xurt û zexm bû. Ava zelal vexwar, goştê gamêşan biraşt û carna jî bi hêta devê xwe têr kir.

Suhrab berî Ristem li meydana cengê amade bû. Di milê wî de kemend, di destekî wî de jî kevan hebû. Mîna ejderhayek serxweş vir de û wê de baz dida û halanan di xwe dida. Mîna sakê gamêşê, mîna boxê buharê toz û dûmanê bi ser serê xwe dixist. Ristem ew di vê rewşê de dît, kêfa wî şikiya, xemgîn bû, rûyê wî zer bû. Li ser encama vî şerî ponijî. Lê belê gava Suhrab çav pê ket, hevesa şer lê zêde bû, mîna berê diljan nîn bû. Xwe qurre dikir, pişik jê re çê dibû. Awurek tûj da Ristem û seranpê hûr hûr lê nihêrî. Piştre qêriya:

-Tu cara yekem ji destê min xelas bûyî, lê vêcarê" Tu çawa diwêrî serî li ber min rakî" Te riya xwe şaş kiriye, an tu ji canê û ruhê xwe ecz bûyî" Min cara ewul te da xatirê wî temenê te. Tu vêcarê jî têkevî lepê min, ez nema ji ser sînga te radibim!

Xuyê Ristem bû; tu car tan û niçê mêran li xwe nedîtibû û di bin galgalan de nedima. Wuha got:

-Pêlewanê xişîm! Pişik ji te re çê bûye, tu fexr bûyî û ji ola xwe derketî yî! Xwarzê, mirovên gernas û egît, mîna te xwe qurre nakin û pozê xwe bilind nakin. Tu dê bîstkê bi şûn de bibînî da ev extiyar wê çi bîne serê te?

Roj bejnek dudo kişiya bû, vekirî bû û hewa çîk sayî bû gava cardin rahiştin hev û din. Çawa gihîştin hev, bi kembera hev û din ve zeliqîn. Ristem pêşî teql li Suhrab xist, lê belê pêlewanê xort giran bû weke risas, qet ji cîh nelibitî. Mîna sîngekî mirov di erdê de kuta be. Ev yek, kurê Zal tirsand. Çend caran ceriband, lê Suhrab pê da erdê. Dû re wî Ristem daf da. Wuha li dor hev çûn û hatin çend caran.

Dîsa bi hev girtin, Ristem bi serê Suhrab girt û pişta wî li hev tewand, ew gav qewet di piştê de nehişt, ew êşand. Piştre, bi vê yekê nesekinî, ew

bilind kir û li erdê xist. Suwarê Rexşê Belek, pêlewanekî zana bû û gelek xaxên giran dîtibû li dunê. Ûsil û qayde, dek û çivên pêlewaniyê baş dizanî bû. Mirov bi ku devera bedena pêlewan bigre diêşê, jarî û hestyarî di ku der de ye hîn kiribû. Karê pêlewaniyê, ne tiştek hêsan bû. Wî temenê xwe wuha buhurandibû. Zanî bû ku heke vê carê keys têkeve destê Suhrab, ew dê nehêle ji erdê rabe. Niha Suhrab li erdê bû, lê Ristem pêjna rabûna wî hilanî. Lewma keys û fesal neda wî. Şûr kişand û tavilê bi çelengî sînga wî çirand. Suhrab, mîna dîkê serjêkirî perpitî. Kêliya xwîn ji canê wî avêt, wî êş hes nekir, tenê axînek kûr, gelekî kûr ji kezebê kişand. Ev axîn du maneyên xwe hebû: yek; “min bavê xwe nedît û mirim,” dudo; “cara yekem min vî reqîbî avêt erdê, lê belê min ew efû kir.” Bêhna mirina zer û xwîna sor çû pozê wî wuha got:

“Te ev felaket bi min nekir,

Lê belê min bi xwe kir,

Dem miftê da destê te,

218

Jîyana min fedayê te kir.

Xalo, sûc ne yê te ye,

Kuştin riya mêra ye,

Mirin emrê Xweda ye,

Derdê mezin ew derde,

Kêf kêfa neyara ye,

Wê bêjin Suhrab kuştin,

Pêlewanî bi me maye...

Ax lo bavo, lo bavo, wax lo bavo lo bavo...

Biçûk bûm, sêwî mezin bûm xalo,

Diya min gotibû nîşa^n bavo,

Emrê min bi heza wî derbas bû,

Lê niha hêviya min jî xelas bû,

Hemî lêgerîna min li valahiyê çû,

Min ne bav dît, ne reng, ne jî rû,

Ez va dimrim, êş û xeter jî li dû,

Masî û teyr, hesp an jî stêrk bî tu,

Nafilitî ji bavê min tu zû bi zû.

Ax lo bavo lo bavo, wax lo bavo lo bavo."

Suhrab di nava xwînê de ma. Hilma wî ya germ li rûyê bavê wî dixist. Wuha domand:

-Rabe, ez birîndarim, birîna min pir xedar e. Heke tu ne pêlewan, lê belê ejderha bî, rojê jî bi destê xwe bigrî û bavêjî aliyekî, dîsa gava bavê min bibihîze ku balîfê min bûye parçeyek zinar, hetanî piyê wî av û ax bigre, ew dê li te bigere û te bibîne û wê heyfa min ji te bistîne. Mitleq wê mirovek min di vî halî de bibîne û roj wê bê ku ev rewşa ha ji bavê min î

Ristemê Zal re bêje, tu kuştin bâşahid nîn e xalo. Wê hinek kes ji bavê min re bêjin Suhrabê te kuştin, cesedê wî avêtin erda sara cemidî û hetanî wexta mir jî, di ber sekratê de navê te ji ser zimanê wî neket.

Dema Ristem van bêjeyan bihîst, sewuşî erdê û dilê wî xeliya. Dunya lê guherî, her alî reş û tarî bû. Derman di çokên wî de nema, taqet ji masûlkên wî derket. Ji xwe ve çû û li rex kurê xwe dirêjî ser axê bû. Hiş ji

sera neçûbû, serê xwe di axê da. Dest bi girî kir û naliya. Ji wan gotinên Suhrab yên dawî bawer nekir. Bi zimanekî giran, bi zehmetî peyivî:

-Tu kîjan nîşan û alametê Ristem dizanî? Ka bêje?

-Ka milê min veke, mohra ku bavê min dabû diya min wa ye di nava hemayilê de. Bi çavê xwe bibîne.

Ristem bi destê lerzok kincê qetiyayî ji ser milê wî da alî. Ku çi bibîne? Çend sal berê mohra ku ji Tehmîne re şandibû wa ye bi milê Suhrab ve ye û xwîn niqutiye ser. Hema li çokên xwe xist û kûr naliya:

-Ax lawo, ax lawo! Ew mirovê felekreş ez im lawo! Ez bi qurbana te bim. Bila piştî vê yekê, nav û dengê min di bin erdê keve. Xwezî ez bicehimim û bi kuştinek sosret herim.

Mîna ku xwîn rijiyabû mêjiyê wî. Him digiriya û him jî xweliyê li serê xwe dikir û pora xwe dikişand. Suhrab ew di vî halî de dît û hêdîka axifî:

-Ger bi rastî jî Ristem tu bî, bizanibe ku tu sedemî rika xwe bûyî qatilê lawê xwe. Bona aşîtîyê ez gelekî li ber te geriyam, ez ketim bextê te. Lê belê gotinên min ketin guhekî te, lê di yê din re derketin. Niha jî tu loma li min dikî, lê dereng mayî! Şifqeta bavîtîyê piçek jî bi te re nîn e. Roja ku ez derketim seferê û dengê defên cengê bilind bûn, diya min ew hemayil bi milê min ve kir û got “Lawo, oxira te ya xêrê be, Ev

220

diyariye ji bavê te, veşêre. Roj heye ku ew bi kêrî te were.” Belê, rast e ew gelekî bi kêrî min hat! Lê mixabin piştî xwîn bi ser de niqutî! Dereng e bavo, dereng e. Bêjeya “bavo” çiqas xweş e.

Ristem kinc û zerxê kurê xwe jêkir û hemayila milê wî vekir. Ew gav êş û elemek kûr li bedena wî belav bû. Hewar û axîn kişand û bi neynokên xwe

qirik û sînga xwe çirand, xwîna xwe jî tev li a kurê xwe kir. Di ber xwe de hêdîka lorand: “Kurê mino, egîtê mala bavê mino! Ev êş û elem para min e! Wax lawo, wax!”

Dengê “wax lawo, wax lawo” di gelî û zinaran de, di çiya û çol û newalan de olan da û ev deng dîsa bi ser Ristemê dilreben de vegeriya û di tasa mêjiyê wî de cîh veda. Li ser axê giriya û bi qêrîn kir zare zar hetanî xwîn ji çavên wî niqutî erdê.

Suhrab got:

-Bavo! Êdî girî bi kêrî tiştekî nayê. Çi bûye, jixwe bûye. Zarîna te, min ji te re venagerîne.

Roj çûbû ava. Tarî û serma, bi dizî mîna mirina ji nişka ve dihat; kêlîkê bi şûn de jî her cîhî zeft kir. Leşkeren Ristem ketibûn fikaran, çavê wan li riya Pêlewanê Cîhanê bû. Lê ew nedihat. Di encamê de, bîst şe^a^n Iranî li hespan suwar bûn û hatin cîhê şer. Du hesp dîtin, her du jî li piya bûn, lê belê di nava toz û axê de mabûn. Pêjna Ristem nedihat. Zînê Rexşê Belek vala bû. Ew gav ew jî girîyan û bi ser Kawûs de zîvirîn, gotin qey Ristem hatiye kuştin. Dibêjin nûçeya xareb zû belav dibe. Leşkeran nûçe bihîstin û bi kuştina Ristem bawer kirin.

Kawûs bang li Tûs kir, got “Lez bike, bêje bila def û borî lêxin!” Paşê leşker û pêlewanan civand û wuha axifî: “Bila niwînerek zana li ser pişta devê suwar bibe û here meydana cengê û bila agahdarî ji jiyana Suhrab bigre û dîsa vegere û

were cem min. Heke bi rastî jî wî zora Ristem biribe, jixwe divê em hemî bi ser halê Iranê ve bigrîn. Piştî Ristem kesek nikare serî li hember Suhrab rake.”

Niwîner derket rê.

Ji alî din ve, Suhrab bi bavê xwe re, digel wê rewşa birîndariyê, dîsa gazind û lome dikir:

-Jixwe hey ez yê mirinê me, hêviya xwe ji min bibirin. Ez ketime wê xeterê ku rewşa Tirkan wê xerab bibe. Bavo, qet nebe, ji niha û pê ve were rayê û bila êdî piyarî têkeve qelbê te. Here, xwe bigihîne Keykawûs, nehêle ku ew art^ê bişîne ser axa Tûran û Semenganê. Sûcê gelê wan welatan nîn e, leşker û pêlewanên wan bi min xapiyan, lewma êrî^ anîn ser we. Min mizgîniya serkeftinê dabû wan. Min ji wan re gotibû ku, ez bavê xwe Ristem li ser rûyê erdê zindî bibînim, ez li dunê kesekî xwey tac û text nahêlim. Min nizanî bû ruhstênê min bavê min e! Qelayek nêzîkî me heye, pêlewanekî wêrek xwediyê wur e. Navê wî Hêjîr e. Min ew dîl girtibû û avêtibû zîndanê. Min te ji wî pirsî, lê belê wî min şaş kir û xapand. Mebesta wî, bi vî awayî xwe ji min xelas bike. Min bi gotinên wî bawer kir û lewma min guhê xwe ji ser te birrî. Bêhêvî bûm. Gava tu vegeriyayî, tu wî nekuje, lê belê hîn bike ew kî ye û çima wuha min xapand. Min mşa^n ku diya min di derheqa te de gotibû, hemî li te dîtin. Lê min bi çavê xwe bawer nekir. Di qedera min de kuştinek wuha hebû. Kuştina bi destê bavê! Niha li jiyana xwe difikirim: ez mîna brûskekê hatim rûyê erdê, niha jî mîna bablîsokê koç dikim. Jîyana vê dunê, her daîm dilreşî ye. Niha ez jê xelas dibim. Dilê min bi xwîn û çavê min şil e. Nefesa dawîn dikşînim pişika xwe.

Ristem ew gav bi dilekî birîndar rabû. Li Rexş suwar bû û mîna ewrê buharê çargahvî firiya. Ne got ev çem e, ne got ev

222

çiya ye. Bi fedî û şermezarî, bi qêrîn û hawar hat bin konê xwe. Pêlewan û leşkeren Iranî lê civiyan. Kêfa wan hat, lewma dua kirin, axê maç kirin.

Lê belê xêzikên şî^ di rûyê Ristem de dixuyan. Ser û çav, dev û pozê wî hemî tijî ax bûbû. Kinc û zerx zîval zîvalî bûbûn, sîng di xwînê de sor bûbû. Bi çavekî ecêbmayî li rewş û tendurustiya wî pirsîn. Ristem got hal û mesele ev. Ew gav pêlewanên hevalê wî jî pê re dest bi girî kirin. Ev deng li nav konan belav bû. Ristem got "Bi Tûraniyan re cengê nekin. Ev xerabî û dilreşî besî min e. Ez qatilê ewladê xwe me! Ev qursa reş hetanî mirinê wê li ser eniya min be û dilê min wê tucar spî nebe."

Birayê wî hat. Zuware dilşewat bû û ji birîna xwe ya kevn rihet bûbû. Li Suhrab pirsî. Kekê wî got "Qet nepirse! Min kurê xwe birîndar kir, birîna wî xedar e. Ez poşman im, Bi vê extiyariya xwe min kesekî nedît, min rabû xwîna lawê xwe rêt!" Ristem bang li katib kir, ji Hûman re name nivîsî û şand. Tê de got:

"Bes e ev şer! Were em agirbesê eşkere bikin. Dema cengê buhurî. Bila şûr têkevin kewdanan û di wur de zeng bigrin. Tu fermandarî, xafil nîn be! Te, sedemî wê dilxerabî û xereza xwe, gotina rast ji Suhrab re negot. Tu bûyî sedemê vê qetlê û ev agirê canê min û van rondikên bixwîn." Zuware namê ji Hûman re bir û di vegerê de bersivek wuha anî:

"Min te ji Suhrab ne veşartiye. Mirovê ku te ji wî veşart û te pê neda nasîn Hêjîr e. Ew mirovekî şerxwaz e. Yê ku ev felaket anî serê te ew e. Niha karê me yê yekemîn, jêkirina serê wî ye!"

Ristem kêliya namê xwend bi çavekî sor rabû piya. Dîsa mertala kalikê xwe hilanî. Şere Ab û Mînas û Dêwê Spî di bîr anî. Berê hefsarê hespê ber bi cîhê Hêjîr ve li ba xist. Rexş xwe

heliqand, fire fir bi pozê wî ket û xweş çû. Dotira rojê xwe gihand Birca Spî. Tavilê bi qirika wî girt û bi hêrs ew avêt erdê, xencerê ji ber xwe deranî û da ser zengilorka wî. Ew gav li wur gelek mirovên pîr û kal hebûn. Ev rewş dîtin, hatin xwe avêtin piyê Ristem, nehiştin, gotin "Guneh e,

sûcek kiriye, lê çewtî li biçûkan, efûkirin para mezinan e. Wî bide xatirê jin û zarokên wî.”

Ristem ji wur vegeriya, xwe gihand cem lawê xwe. Tûs, Gustehem û Guhderz jî xwe gihandin wî, pê re hatin. Li rewşa Suhrab nihêrî, dilê wî keliya, ser û binê hev bû. Xencer ji ber xwe deranî û bilind kir, xwest li ser dilê xwe bixe. Lê belê pêlewanên hevalê wî nehiştin. Guhderz got:

-Ji niha û pê ve tu ezman jî bînî xwarê, dîsa feyde nake. Tu xerabiyê bi xwe bikî jî, êşa kurê te natefe. Ya Pêlewanê Cîhanê! Kesekî bêkeser û derd, bêxemxur heye gelo?

Ristem li rûyê hevalê xwe yê wefakar nihêrî û cewaba wî

da:

-Tu rast dibêjî. Madem wulo ye, divê em wî rihet bikin. Rabe, nesekine biçe cem Kawûs. Her tiştî jê re bêje. Di gencîneya wî de dermanek heye, heta niha ji hemîkesî veşartiye. Ew derman ji birînan re baş e. Ger zû bigijînî vir, Suhrab wê pê rihet bibe. Bila wî dermanî têxe stekana şerabê û bide te. Em dê li birîna Suhrab bikin. Bêje ya Şehînşahê me, ger Suhrab rihet bibe, ew dê jî mîna Ristem li ber derê te bibe kole!

Mîna ecacokê derket Guhderz. Li rê nesekinî û ewlê nebû. Heta xwe gihand cem Keykawûs. Gotinên Ristemê Zal jê re got. Şah, bi ba^ş lê nihêrî û guhdarî kir. Lê belê bi şalûsî axifî:

-Qasî ku kêfa min ji Ristem re tê, ji kesekî re nayê. Min ew kir Pêlewanê Cîhanê, ez dê çawa xerabiya wî bixwazim? Lê belê ger ez derman jê re bişînim, Suhrab dê rihet bibe. Dû re?

224

Dû re wê çi bibe tu zanî? Wê bav û kur serî li ber me hildin! Ez nabêjim, lê tu bêje; ka kî dikare li ber wan raweste? Ne ez dikarim ne jî tu! Ew dê serê me jêkin, gewdê me bavêjin ser poxangê ber kûçikan. Ez wê roja ku Ristem min li pêş çavê we rezîl kir, roja ku gurmisk li pozê Tûs xist, ji bîr dikim? Heysiyeta min kir pere pere! Ger Suhrab rihet bibe û mil bide bavê xwe, ji bilî gorê wê tu sitar ji min re nemîne. Em dê ji destê wan werin emanê!

Guhderzî bêçare bû, destvala û sitûxwar vegeriya hat, Ji Ristem re wuha got:

-Xuyên Padîşah, mîna zebeşên kafiran yê tal e. Lewma dostê wî nîn in û ew naxwaze ji derdê kesekî re bibe derman. Divê tu bi xwe biçî û bi zorê derman jê bistînî.

Ristemê Zal bi hêrs û kîn rabû, Suhrab li ser xalîçeyek nexşkirî dirêj kir û ew xist xew. Piyê xwe di zengûya Rexş re kir. Hesp ajot, dîsa damûska caniyê belek mîna pêlen bahrê pêl da, dîsa dîn bû, çirûsk ji ber nalên wî yên şûşe çûn. Demekê wuha bi rê ve çû, di dilê wî de kuştina Kawûs hebû. Lê belê ji nişka ve dengek li paş wî hat. Rawesta. Suwarî xwe gihandê û jê re got:

-Ya Pêlewanê Cîhanê! Suhrab êdî ji te derman naxwaze, tabûtê dixwaze, vegere.

Ev tîra tûj, ya serî bi jehrî di kezeba wî re çû û tê de qûç bû. Axîn kişand. Axîn û dîsa axîn... Bijangan bi ser çavên sor de girt. Ji hespê piya bû û dîsa xweliyê bi serê xwe de kir.

Cesedê Suhrab birin Semenganê. Pêlewanê Tûranî jî pê re çûn. Padîşahê Semenganê, kalikê Suhrab digel Tehmîne ve hat pêşiya wî. Tabût li ser milê pêlewanan bû. Dengê borî û zengilên Hindê bona şî^ belav dibû.

Diya wî çawa çav pê ket, şalik ji ser wî hilanî, sînga wî ya bi şûr qelaştî dît. Qêrîn pê ket:

“Lawo, ez bi qurban, ez bi gorî lawo!

Min ji te re negot bavé xwe nas bike,

Milê xwe bide wî ûrt ûcaxé me xelas bike,

Lé te bi gotina diya xwe nekir,

Efrasîyab te xirand, ji hiş û fam kir,

Bav û kur li hev arand, wî te deman kir!

Ax lawo, lawo, ez bi gorî lawo!

Min nav û nîşanrn Ristemê Zal ji te re got Te bi ya min nekir, lé dil û ceger kire sot,

Bav sîng çirand şikest parsû, mil kir kot,

Hemayila milê te nedît eş û elem kire cot.

Lawo lawo, bémirado lawo, xêrnediyo lawo!

Vê sibeké dilé min ji dilan dilekî delû-dîn e,

Seré dilé min bi kule, nava dilé min bi kîn e,

Biné dilé min bi xem e, bi xetere, bi birîne,

Kulê tu bi sé kul bî, bikevî mala Kawûsê Keyanî,

Fesad û gelacé Tûranê, Efrasîyabé Pêşengî ne,

Çawa bav û kur berra hev dan bi dek û zanîne,

Mala me xera kirin, agir bi koné me ve danîne,

Cegera Suhrabê min sotin, ber û sîng qelaştî ne.

Ez’é rabim béjim hewar e, heft bavé Keyaniyan hewar e, Belkî di hewara min de were kuré Samê Nerîman,

Seroké Qela Zabilé, Zalé Zêrîn, méré çav şîne.”

Tehmîne şîn giréda, pora seré xwe ta bi ta hemî kişand, ser û rûçik bi naperûkan anî xwaré û peritand, xwe di ax û xwîné de

gemirand. Li ser cenazé kuré xwe lorand û bi şev û roj lawuj got:

“Ez’é bi tuxubé Semenganê diketim di honikaya sibé da, Min dît Ristem li Rexş suware hêdî hédî té ji wé da,

Suhrab li ber suwar e, lé birîndar e, di kûraniya xewé da, Heyfa min li kuştina wî nayé, ez bi ber wî nakevim,

Ew cérek bû ji céré avé, şikest di riya kaniyê da,

Heyfa min li wé yeké té, xelké bêje Suhrabo, naşîto; Nezano û xerîbdosto, lé kuştiyo di ber xelké da...”

12.

Piştî kuştina Suhrab, dilé Keykawûs ket cîh, tirsa wî ji Ristem şikiya, ji sitirîyé nav çavé xwe xelas bû. Bi Tûraniyan re aşîtî çékir, édî érîşén Tirkan nedihat ser Irané. Bi vé tékiliya nerm, Keykawûs biryarek da. Qîza Gersîyûzê Tûranî ji xwe re xwest û ew li xwe mar kir, tev li harema xwe kir. Ew keçek xweşik bû, nav û dengé wé li herémé belav bûbû.

Salek buhurî, xwedé zarokek kurîn da wé. Navé wî Sîyavûş danîn.

Sal berra pey hev dan. Sîyavûş mezin bû, pisporan ew ji şer re elimandin. Bû xortekî jîr û jêhatî. Wan salan dîsa nava Keyaniyan û Tûraniyan xera bû. Kawûs kuré xwe mîna fermandarê artêşa Irané şand cenga Efrasîyab. Sîyavûş di şer de gelekî çeleng bû. Bo vé yeké di nav gel de hat naskirin û pêlewanan jî jé hez kir. Révebir û serbazén Kawûs bawerî bi wî anîn. Roj hat, Kawûs kuré xwe kir paşayê Kûhistanê ku ev

herêm eyaletek îranê bû û di nava herêmê de taybetiyên xwe hebûn.

Rojek ji rojan, Sîyavûş kincên serleşkeriyê li xwe kir, kembera xwe girêda, nîşanan bi xwe ve kir û berê xwe da alî îranê. Lê vêcarê ne bi mebesta cengê. Nûçe gihîşt Efrasîyab, gotin Sîyavûş derketiye rê. Padîşahê Tûranê rabû, leşker û pêlewanan li hev civand û lijneyek ji wan pêk anî, bi dengê defan re şand pêşiya Sîyavûş. Çar fîlên spî xemiland, textekî ji fîrûze da ser pişta fîlekî, sê kursîyên ji zêr jî bi xwe re birin. Pîran, digel ala xwe li pêş bilind kiribû, li ser hespê rêveberî û serokatî jî ji wan re kir.

Gava Sîyavûş ji dûr ve ala Pîran, dengê fîlan û hîrîna hespan bihîst, hesp ajot, xwe gihand Pîran û ew himêz kir. Pîran peznê wî da:

-Min te dîsa wuha saxî û selametî dît, ev ji min re bes e. Hezar qew^ên min yên guharzêrîn di bin fermana te de ne. Derê gencînê jî li te vekiriye.

Her du bi hev re, bi dilşahî û dostanî li rex hev rûniştin. Di bin dengê sitran û rûd û ribaban de, ji deng û behsê dunê, ji rewşa rojevê axifîn. Sîyavûş ew gav rojên berê di bîr anî. Lewma xemgîn bû û bêhemdî ji çavên wî histêr bariyan. Ji Zabilistanê hetanî Kabilistanê, ji bona rûmeta wî, şahî û pîrozbahî hatibû çêkirin. Wê demê ew mêhvanê Ristemê Zal bû. Hemî ekabîr û rîspî jî li wan civiyabûn. Zêr û zîv, misk û amber hatibû rêtin. Lê welatê îranê? Gava rewşa îranê ket bîra wî, ew gav Sîyavûş axînek ji kezeba şewutî kişand.

Pîran li rûyê wî nihêrî û ev halê wî, di reşika çavê wî de dît. Dilê wî pê şewutî, lewma lêvên xwe gez kir. Her du ji wur rabûn, ketin rê. Gava gihîştin Kaçarbaşîyê, li wur rawestiyan û bêhn berdan. Lê tiştekî di dilê Pîran de digeriya, jê re wuha got:

228

-Ya paşayê bi rûmet! Tu mîratxurê hemî padîşahên îranî yî! Tu bi sê xaleyan ji Şahên din yên berê çêtir î: yek; tu ji malbata Keykûbad î û tu ji

wî jî zêdetir î. Bi her awayî li pêş î, dudo; zimanê te şêrîn e û gotina derew ji devê te dernayê û sîsê; rûyê te lihevhatî û xweşik e, lewma tu di kîja welatî re bibuhurî, tu dê li wê deverê tovê hezkirinê bireşînî. Ji alî din ve, tu ji malbata Gersiyûz î. Ev jî siûda te ye, Tûranî bo vê yekê ji te hez dikin.

Her du bi hev re hilkişiyan qesra Efrasîyab. Padîşahê Tûranê derket pêşiya wan, li ber şêmûka derî xêrhatin di Sîyavûş da. Jê re çend gotinan bi lêv kir:

-Şer û pevçûn, xerabî û kîn û xerez serî xist xewê. Xezal û piling wê êdî ji kaniyekê avê vexwun û wê gur û mîh bi hev re biçêrin. Dunya li bin guhê hev ket, lê belê niha welatên me û yê we, êdî ji cengê têr bûn. Bes e, ji dêvla bêhna xwînê ve, bila bêhna gulan were pozê me. Hezkirin û muhuba te ketiye dilê Tûraniyan. Qumandarê min yê menşûr Pîran e, va ye ew jî bila di bin fermana te de be. Ez di dewsa bavê te de, tu jî kurê min.

Sîyavûş devliken bû. Bi çavekî ronî, bi bişirîn li Efrasîyab nihêrî.

Roj buhurîn, ew li Tûranê mêhvan ma. Rojekê li ser masa vexwarinê, kêliya wî û Pîran şûşeyên şerabê li hev xistin, qumandarê Tûranî di guhê wî de kir piste pist:

-Tu li pêş çavê xwe meznahiya arteşa Tûranê dibînî. Her diçe, em hêza xwe qewîn dikin. Serê taca padîşahê me digihîje nava ewran. Ger tu pê re mervatî deynî, tu dê di nava me de gelekî şan û şeref bistînî. Qîzên Efrasîyab gelek in û hemî jî mîna zerika hêkê ne. Hêk qelişiye û jê derketine! Yek ji yekî xweşiktir e. Mirov gava wan dibîne, mirov dibêje vê ya na wê ya! Jixwe, Fîrengîs heye ku, qet nepirse, nebîne! Ya Xaliq!

Mirov tiliya xwe gez dike. Xweşikiya por û rûyê wê, li horiyan jî nîn e. Bejna wê bedew e û bisk û keziyên wê reş û huburî ne. Mîna taca ji miskê li ser serê wê ye. Ne li Keşmîre û ne jî li Kabîlê kesek weke wê xweşik û

delal tune. Ger dilê te hebe, ez dê vê yekê di guhê bavê wê de bêjim. Hema tu bêje “herê”, tiştên mayî li birayê te.

Sîyavûş fikirî, mat ma û di ramanan de çû û hat. Li hevalê kêleka xwe wuha vegerand:

-Kesek bi bayê felekê nizan e. Bona vê yekê, divê ez li Tûranê bincîh bibim. Ev biryar jî tiştekî buha ye; ango divê ez êdî rûyê pêlewanên Iranî nebînim. Rûyê Behramê Hêç, Zengeyê Şaveran, Gîw û Şapûr. Divê ez Zalê Zêrîn û Ristemê kurê wî jî ji bîr bikim. Madem tu dostê min î û xerabiya min jî naxwazî, ka jê re bêje. Lê ez ji te rica dikim, bila ev tişt bi dizî be. Nebî nebî, tu ji devê xwe nerevînî ha!

Pîran ji cem Sîyavûş rabû, raste rast berê xwe da qesra Efrasîyab. dergevanan ew girtin hundur. Derket oda Padîşah, qasek bi şûn de Efrasîyab hat û bi çavekî belloqî jê pirsî:

-Te xêr e, tu çima hatî vir? Artışa min, hemî zêr û gencîneyên din di oxira te de ne. Ger tu ji bona azadkirina dîlan hatibî, ez dê wan bidim xatirê te û wan berdim. Na, heke tu tac û text, şûr û mohr ji min dixwazî, mesekine bêje. Yê bêje derdê dilê xwe, wê bibîne dermanê xwe.

Pîran got:

-Sipasdarê te me ya Padîşahê Tûran. Şukur, her tiştên min bi saya te hene. ArtTş, şûr û mohr û text jî. Ez bona berdana hêsîran jî nehatime. Lê belê ez dixwazim îroj qala Sîyavûş bikim ji te re. Ew niha li cem min mêvane. Niha ew te mîna bavê xwe nêzîk dibîne. Tu jî zanî diya wî ji me ye. Niha jî ez dixwazim tu qenciyekê pê bikî. Qîzek te heye, navê wê Frengîs

e, pir xweşik e. ew layiqî qesr û qonaxên Sîyavûş e. Ger tu jî dil bikî û bêjî herê, ez jî û ew jî, em dê tevde dilşa bibin. Ez dixwazim em mervatiyekê bi wî re deynin. Ka tu dibêjî çi?

Efrasîyab serê xwe berjêr kir, kuta erdê û tu tişt negot. Dû re dilê wî nerm bû:

-Ez baş bawer im ku, ji tovê Kawûs û ji malbata me, wê zarokên jîr û jêhatî werin dunê. Weke agir û av bigihîjin hev. Yeqîn dikim ku dawiya vê zewacê wê ne xerab be. Dibe ku çêtirîn be. Ez dê fermana vê zewacê bidim. Xwestek bila di dil de nemîne.

Pîran bejna xwe li hember wî tewand û bi kêf û şahî rabû û ji qesrê derket. Hîç nesekinî, vegeriya cem Sîyavûş û bersiva Padîşah, mîna ku gotibû jê re bi lêv kir. Ew şev hetanî sibehê mey vexwarin; xema dilan belav kirin.

Dotira rojê, Sîyavûş û Frengîs mîna heyv û rojê li kêleka hev û din rûniştin. Efrasîyab û Pîran, li gor urf û adetên wê demê, jîrik û gelê qonaxê civandin, şert û şurûdên zewaca wan bincîh anîn û ew li hev û din mar kirin. Dilê wan bi hev ve hat girêdanê. Zava, ji serî hetanî pê bi ba^ş bal û dêna xwe da bûkê. Keziyên wê dirêj bûn û bi ser sîngê de dihatin xwarê. Çavên wê mîna stêrka sibehê diçûrisî. Dev û lêvên wê mîna kevirê akîk sor dikir. Mirov digot qey ew stêrka Venusê ye. Bêhna amberê jê dihat. Xwey piyarî û merhemet bû. Qirikek zirav li ser bû û canê wê tenik bu; gava av vedixwar, di gerdena wê de dixwuya. Mirov fîtikek tenê li eniya wê bixistana, hingî nazik bû, canê wê hetanî paniyê wê şîn bibûyana. Bejna wê zirav bû weke şitila biyê.

Her du ji hev gelekî hez kirin.. Muhuba dilê wan roj bo roj zêde bû ji hev û din re. Efrasîyab jî vê yekê didît; lewma ji zavê xwe re gurz û mertal, kemend û şûr amade kir. Herêmeke fireh,

ji Tûranê hetanî Derya Çînê xist bin fermandariya wî. Xelata wî ev bû. Roj berra saetan, mehan da dû hefteyan û sal jî li pey demsalan hatin. Gersîyûz ji hezkirina zava û xezûr didexisî. Digel Sîyavûş neviyê wî bû jî, dîsa jê hîç hez nedikir. Weke xiltekî kor ket navbera her duyan û bi fesadî û gellaciyê nava wan xera kir. Bi vir û derewan, bi îftirayan dilê wan ji hev sar kir. Sitiriya rik û xereziyê, dilreşî û dijminiyê di nava wan de çand.

Sîyavûş vegeriya cem bavê xwe. Demek wuha derbas bû. Rojekê Efrasîyab name bi destê Gersîyûz jê re şand û xwest zavê wî were cem wî. Sîyavûş ew name xwend û piştre bersivek wuha li ser kaxiz reşand:

“Ya Padîşahê dilşa û serbilind! Gava min name ji te girt, gelekî kêfa min hat. Di namê de te gotiye ku Frengîs jî bi xwe re bîne. Lê mixabin ew van rojan nexweş e, halê wê tuneye û gezek nan jî di qirika wê re naçe xwarê. Jar ketiye, bûye derzî. Jixwe ez newêrim ji ber serê wê rabim û ew tenê bihêlim. Bi rastî, ez jî dixwazim te bibînim. Çaxê Frengîs hinekî were xwe, ez nasekinim û ez dê werim.”

Gersîyûz namê ji destê katibê Sîyavûş girt bona bigihîne Efrasîyab. Sê roj û sê şev li rê çû, roja çaran gihîşt Tûranê. Dema Efrasîyab çav pê ket, dît ku Gersîyûz bi made ye, sikûmê wî nexweş e, reş bûye. Li rûyê mirov nanihêre. Padîşah pirsî:

-Te xêr e? Tu çima wuha madekirî yî û bi telaş û fikar î? Fêlbazî û fesadî karê wî bû, lewma wuha bersiv da: -Paşayê min, mîrê mîran! Gava rewş xerab be û roj tarî be, mirov dikeve tatêlê û xeman dikşîne. Ka reng û rû li mirov dimîne? Serqisê, Sîya-^ê zavê te, gava ez çûm mêvandariya wî, jixwe li rûyê min jî meyze nekir. Tewer nameya te jî nexwend, avêt aliyekî. Min li nava şekalan û li ser çokan da

rûniştandin. Ka mazûvan li mêvanan wuha dikin? Îranî li dora wî ne. Ji her herêmî name jê re tên, ji Rûm û Çînê jî leşker ew ziyaret dikin. Ez bawer im ku ew xwe ji cengê re hazir dike. Rewş wusa dixuye. Ger tu dereng bimînî, ditirsim ku ew dê berê artûşa xwe bide welatê Tûranê û bêbextiyê bi te re bike. Pêşiya gotiye mîrê min: Kî xafil e, ew kafir e!

Efrasîyab bi hêrs rabû piya û li ber çavê wî geh çû jora odê û geh hat jêr. Destê xwe da pişt xwe û bi lez çû û hat. Weke ku xwîn pijiqî be mêjiyê wî. Serê wî mîna berê ku çawa ji Îraniyan nefret dikir, dîsa wusa tijî rik û xerez bû. Nameya ku Sîyavûş şandibû, ji destê Gersîyûz kaş kir, hema li piya çav lê gerand, lê nexwend. Qet li ser nefikirî û derhal çirand, parçe parçe kir û avêt. Bang li qumandar û pêlewanan kir, got lez bikin, art^ê bicivînin, deriyê cebilxanan vekin.

Ji alî din ve, Sîyavûş li benda cewaba mektûbê ma. Mehek dudo, sisê... Çavê wî li rê qerimî, tu kes nehat. Fikar di dilê wî de zêde bûn, xewnên xerab dît. Giriya, zanî bû ku tiştek heye. Lê çi? Rûyê wî çilmisî, çavên wî sor bûn. Li hespekî zexel suwar bû, tev li fermandar û şervanan berê xwe da tuxubê Îranê. Ji wur buhurî, lê belê hêja nîv fersah rê neçûbû, rast li xezûrê xwe hat. Leşkeren bi gurz û zerx û şûran dor lê pêçan. Hatin nêzîk û kemîn danîn, xwe veşartin. Wî jî zerxê xwe girêda û şûr deranî. Rawesta, destûra şer neda hevalên xwe. Bang li xezûrê xwe kir:

-Tu çi ji min dixwazî? Çima tevî leşkeran hetanî vir hatî? Tu xezûrê min î, di dewsa bavê min de yî, jixwe destê min li ber te ranabe.

Lê belê Efrasîyab bersiv neda. Amadehiya cengê kir. Rewş kambax bû, behna nexweş hat pozê Sîyavûş, rûyên

Tûraniyan qemitî bûn, awurên wan tûj bûn. Padîşahâ Tûranê ferman da:

-Hemiyan di bin şûr re derbas bikin! Xwîn birêjin, xwîn,

xwîn!

Lê belê Sîyavûş ji êla xwe re got:

-Wan nekujin, tenê xwe biparêzin.

Tûraniyan zûka dor li wan girtin, hezar leşker û pêlewanên bijarte bi Sîyavûş re bûn, hemiyan jî kuştin. Dû re, bi her carekê re pêncî an jî şêst tîr barandin ser kurê Kawûs. Ew birîndar bû û ji ser hespê daqulî erdê bû.

Di nava artışa Tûraniyan de bi navê Gerûy pêlewanek hebû, zalimekî mîna wî tune bûn, yekî cellad bû. Navê bavê wî Zîrih bû, lewma jê re digotin Gerûyê Zîrih. Dît ku Sîyavûş ji ser hespê ket, tavilê hespa xwe ajot ser û çû, destê wî ew gav girêda û bi vê yekê jî nesekinî, qeyd jî li sitûyê wî xist. Zilamên Efrasîyab li ser serê wî kom bûn û ew bi erdê re kaş kirin. Ew bi vê bêkeysiyê hetanî bajêr birin.

Biryara Efrasîyab bi tund û tûj bû:

-Wî ji rê dûr bikin, bibin cîhekî tenha, bila kesek we û wî nebîne. Li cîhekî ku qet giya lê tune be, serê wî ji gewde hilqetînin û xwîna wî birêjin. Lez bikin, dereng nemînin û ji tiştekî jî netirsin!

Pîlsemê birayê Pîran ew gav li cem Efrasîyab bû, li dijî vê biryarê derket:

-Tu li hiş î? Çi dikî? Bi vê k^tinê, tu dê tovê dara dijminahî, rik û kînê biçênî! Ya Padîşahê Mezin! Seriyê ku layiqî taca zêrîn be, divê neyê jêkirin! Tu jî dizanî ku Keykawûs û Ristemê Zal wê mitleq xwîna wî li erdê nehêlin û tola wî wê ji te bistînin. Kawûs bavê wî ye, Ristem jî seydayê wî ye. Sibehê Ristemê Zalê serbilindê Iraniyan, Guhderz û Gurgîn, Ferîburzê

234

Çermqetên, Behramê Hêç, Ferhad û Tûs, Zuware û Zengeyê Şaveran şûr bikşînin, bo heyfa Sîyavûş, wê riman li deştê biçikînin. Ew gav ne ez dikarim li hember wan bisekinim, ne tu û ne jî pêlewanên me.

Pîran gotina xwe bi lêv kir û derket. Vê carê Gerûyê Zîrih çû oda Efrasîyab, jê re got:

-Metirse mîrê min! Fersend di dest te de ye. Taliya talî, yê ku zerarê bibîne jî tu yî! Jixwe te artûşa wî qir kir. Piştî vê yekê, ger tu wî efû bikî, ma wê dilê wî li te spî bibe? Na.

Em wan bihêlin li wur, werin ser Frengîs. Qîza Efrasîyab bihîstibû ku mêrê wê dîl ketiye. Rabû, bi kincên zilaman xwe girê da, li hespekî khêl suwar bû, kete rê û di hewariya mêrê xwe de hat. Çawa gihîşt qesra bavê xwe, jê tika kir:

-Bavo, qurbano! Ez ketime bextê te û Hurmuz! Tu zaroka min sêwî û li ber dîwaran nehêlî! Ez niha bihemle me. Tu çima bi gotina fesad û ewanan dikî? Sûcê wî çiye? Ka bêje? Heke tu dixwazî zulmê lê bikî, te nebihîst ku çi hat serê Dehhaqê Xwînxwar? Ji bîr meke bavo; Kawûs hêja nemiriye û Zal û Ristem jî li jiyanê ne.

Rik, rik bû! Padîşah guh neda gotinên qîza xwe. Tewer pê re xeyidî:

-Rabe, zû ji ber çavê min biçe! Tu çi zanî ku ez çi difikirim? Bizîvire mala xwe, qet nesekine li vir!

Dilê Padîşah tarî bûbû, çavê wî kesekî nedidît. Nihêrî ku qîza wî pê daye erdê û naçe. Gazî dergevan kir û bi milê wê girtin ew avêtin bînê zîndanê û derî li ser radan.

Roj roja Gersîyûz bû, fesadiya wî fêkî dabû. Bang li Gerûyê cellad kir û ew bi xwe re anî cem Sîyavûş. Gerûy bi rîyê Sîyavûşê Kawûs girt û ew tan da ser axê. Sîyavûş ew gav dua kir:

-Ya Xwedanê şev û rojan! Va ye ez diçim! Ji xwîna min, ji malbata min mêrxasekî çêbike ku karibe heyfa min hilîne!

Dest û piyên wî girêdayî bûn û tewer qeyd jî li sitûyê wî xistibûn. Ew dîsa di nava bajêr de bi vî halî gerandin, bi erdê re kaş kirin. Dû re ew birin deştek fireh. Gerûy, xencer ji destê Gersîyûz girt, bi pora Sîyavûş girt û ew bir ber nîşangeha tîr û kevanê. Ew der cîhê perwerdehiya tîravêtinê bû. Gerûy, Sîyavûş li wur dirêj kir û teştek anî û li ber serê wî danî. Sitûyê wî mîna yê mêşinekê dirêjî ser teştê kir û ew serjê kir. Xwîna wî jî herikand zikê teştê. Gerûy rahişt teştê û ew bir cîhekî taybet ku berî wê gavê Efrasîyab bi dizîka ji wan re nîşan kiribû. Xwîna teştê li wur rijandin.

Li gor gotinên gotinbêjan, weke ku tê rîwayetkirin salek bi şûn de, li cîhê ku xwîna Sîyavûş lê hatiye rêtin darek şîn tê. Gelê wur, navê “Xwîna Bira” li wê darê datînin û ji xwe re dikin ziyaret.

Dîsa nûçeya nexêrê zû belav bû. Li welatê Nîvrojê gotin, gidîno, hey gidîyano! Dibêjin Sîyavûş bi pezikî serjêkirine û xwîna wî berra teştê dane. Li bajarên Iranê qiyamet rabûye, gel şî^ girêdaye, Keykawûs axê bi ser taca xwe ve reşandiye, kincên pederçahiyê zîval zîvalî kiriye. Gotiye ada min li ber destê Xwedê be, ez hetanî heyfa kurê xwe hilneynim, li ser kursiyê Şehînşahiyê rûnanêm.

Nûçe gihîşt guhê Ristemê Zal û Destanê Kal. Hiş û eql li serê wan nema. Feryad û fîxan, girî û nalîn li nava Qela Zabilê belav bû. Zal li çokên xwe xist, rûyê xwe di birînan de hişt. Zuwareyê birayê Ristem jî ji kerba sînga xwe çirand. Hefteyek wuha, di şî^ de dem buhurandin, roja heyştan ji Keşmîr û Kabîlê gelek leşker hatin, dengê boriyan bilind bû, li dîwarê Qelê olan da. Leşker li hember Pêlewanê Cîhanê rêz girtin.

236

Hêja jî niqutên xwînê ji çavê wî Qelafetfîlî dirijiyan û wuha dinaliya: “Sîyavûş! Felekê padîşahek mîna te nedîtibû! Lê mixabin mirovên xerab û fetbaz biserketin. Ew bextiyar in niha.”

Ristemê Zal, digel pêlewan û leşkeran, rabûn û li hespan suwar bûn, berê xwe dan paytextê, cem Keykawûs. Çend roj bi şûn de gihîştin wur. Kela dilê Ristem rabûbû, lewma bi toza piyê xwe derket oda Keykawûs, jê re wuha got:

-Ji destê padîşahekî mîna te zalim û dînik, welatê Iranê hêja wê gelek zerar bibîne. Min kurê xwe kuşt, sebeb tu yî. Niha jî Sîya-^ê kurê te! Ka bêje, ew ne ji rûyê jina xwe de hat kuştin" Şehînşahê welatekî gava têkeve bin emrê jinekî, hema bila têkeve gorê çêtir e. Te kesek nedît, te hişt Efrasîyab qîza xwe li kurê te mar bike! Heyfa Sîyavûş! Heyfa bejn û bala wî! Ez çi bikim" Dunya êdî yekî mîna wî nabîne. Hetanî ez sax bim li darê dunê, dil û mêjiyê min wê hertim li pey tolhildana wî be.

Kawûs deng nekir, li hember van gotinan tiştek negot, serî kuta navrana xwe. Ristem derî li dû xwe bi şid girt. Teqîna derî li eywanê belav bû. Iranî dest bi amadehiya cengê kirin, mîna rojên berê xwe ji herba Tûraniyan re û xasma xwe ji Efrasîyab re hazir kirin. Pêlewanan haletên xwe hilanîn, li ber derê qesrê rêz û sef girtin. Al kişandin jor. Hesp ji tewlan deranîn. Xêbetên wan derketin rê, defa hewarê lêxist. Deve û fîl, hespên bi şirik û heqîb hêdî hêdî meşiyan. Pêlewanan kember girêda, şûr tazî kirin. Pozê riman berjor kirin. Ji alî din ve dengê boriyên tuncîn jî belav bûn. Li pêş, ala Kawayê Hesinkêr ku li serê şik^ stêrkê hebû pêl da.

Karwan meşiya...

Erd hejiya...

Hespên şer mîna tajiyan, li pâş xweş dibeziyan... Kêlikê wuha li rê çûn. Nav ranên wan şeliqî û kef da. Dema gihîştin nêzîkî tuxubê Tûranê, çavdêr

û nobedaran dîtin ku art^ek ber bi wan ve tê ku ne serî heye û ne jî binî. Li pêşiya Artışa Iranê kurê Ristem Feramûz hebû. Gihîştin tuxubê eyaleta Sîpancapê. Paşayê wî welatî wan sekinand. Ji Feramûz pirsî, “Tu kî yî xwarzê? Êla kî ye ev?” Wî sînga xwe nepixand û serê xwe bilind kir, got “Ez kurê Ristemê Zal im! Di destê bavê min de fîl û dêw jî dikin zare zar. Ger tu bixwazî ew bibînî, wa ye li pey min tê. Lê ger tu bi ya min bikî, xwe ji wî veşêre çêtir e, niha gelekî bi hêrs e, heye ku tola Sîyavûş ji te bistîne!”

Navê wî paşayî Verazad bû. Gelek leşkeren Tûranî jî di nava artışa wî de cîh digirtin. Bi gotina Feramûz bawer nekir û pê neda paş. Xwe ji ser rê neda alî. Ferman da pêlewanên xwe, got ji tu^^şan tîr derxînin û li kevanan bixînin.

Şer li dar ket, Feramûz da pêş mîna gurê har êri^ bir ser wan. Bi her tîrekê re çend leşker bi hev re avêt. Çû, rê li Verazad birrî û rimê li kembera wî xist, keftanê wî çirand. Mîna ku bi mêşekî bigre, bi sitûkura wî girt, ew ji ser zîn bilind kir û li erdê xist. Piştre ji hespê daket û çû ser, bi xencera xwe serê wî jêkir. Li ser ^ê bêserî wuha qêriya:

-Em kîne lo? Ha ji we re! We rik û xerz dixwest. Rik ev e! Mîna tovê pirparê ye, dişitile û zû belav dibe.

Leşkerekî Tûranî ew gav Feramûz dît, dev ji şer berda û li hespê suwar bû û ji meydana cengê reviya. Newal û newal, qot û berpal çû, bêhn nesitend, hetanî seraya Efrasîyab nesekinî. Çû, bi bêhnefLşk ji Padîşah re got “Rabe, xwe zûka girêde. Ristemê Zal dîsa li Rexşê Belek suwar bûye, dîsa gurzê Sam hilgirtiye û tevî xêbetên Iranîyan ber bi me tê. Ew li pey heyfa Sîyavûş e. Verazad derket pêşiya wan, kurê wî serê Verazad

jêkir. Mîna agirê li da'lê, çi dikeve ber wan dişewutînin. Kuç li ser kuç nahêlin. Allaşa Sîpancapê ji hev belav-wela kirin."

Efrasîyabê Bavpêşeng dîsa eniya xwe qermiçand, bi dengekî pihêt û lerzokî bang li navmaliyan kir, got bila seyîs hemî keriyên hespan, colên revoke bînin tewlê. Mifteyên hemî gencîneyan jî derxînin.

Gurz û zerx, tîr û kevan û rim li hemî leşkeran belav kirin. Bona dilê şervanan xweş bikin, zêr û zîv, tac û kember jî deranîn, li pêlewanan parê kirin. Dengê çinxirakên Hindê hat. Suwariyan berê hefsar li ba xist û dizgîn sist kirin, "deh" li hespan kirin. Padîşahê Tûranê bang li kurê xwe kir, got:

-Lawo, roja te ye, de mêraniya xwe şanî bide! Sî hezar leşker bicivîne. Li bayê bezê here, şev û roj ji te re nîn be. ez serê Feramûz ji te dixwazim. Şîreta min li te, xwe ji xezeba bavê wî biparêze.

Kurê wî ku bi navê xwe Surha bû, li bavê xwe vegerand:

-Bavê mino! Tu bi min bawer nakî? Heta niha kesekî ji we canê Ristem ji ser rûyê erdê ranekir, lê belê ev karê min e. Ez dê dest û piyên Feramûz jî girêdim, hefsar têxim serê wî û ew bînim cem te. Bila ji te re bi kerîtî bizire.

Bavê wî:

-Lawo fortan nede xwe. Sozekî pêşiya heye; dibêjin kûçikekî jêhatî û şîyar, dikare bi piling jî. Lê belê şêrekê zexel û ne şerûd ji rovî jî ditirse. Feramûz biçûk nebîne, ew kurê Pêlewanê Cîhanê ye, ew jî şîyar û leheng e.

Surha û Feramûz. Bavê wan Ristem û Efrasîyab, yek ji Tûraniyan û yê din ji Iraniyan ev cara çendan bû ku li hember hev û din cengê dikirin?

Surha ala reş daçikand. Li ser zînê hespê çû pêşiya êlê, berê xwe da deştê. Çûn û çûn. Şev, roj, ba û bapeşk, tiştek li

wan nebû asteng. Gava gihîştin hafa artâşa îranê, çavdêr û notirvanên Keyaniyan ew dîtin. Agahdariya Feramûz pê xistin, gotin wa ye hatin dîsa, neyarên bav û kalan hatin, xwînîyê me hatin, li ser ala wan xwîna Sîyavûş heye. Şûr biriqîn, riman serî li deştê hilda, bux ji axê fûriya û arê cengê jê pêl da. Bêrawestîn, bêfikr û raman, dema gihîştin hev, di hev û din re derbas bûn û tevî rêvebiran li nava hev qelibîn bi mêranî.

Surha, serê rima Feramûz ji dûr ve dît. Ji xwe re kir bergeh û nîşan, bi coşeke bêhempa ajot ser. Kurê pêlewanan, kurê her du neyaran, bi besta dijminiya sed salan bi riman direjî hev kirin. Ewul Feramûz gazî kir: “Hey Tirkê bêsiûd! Feleka te çep geriya. Ez dê niha te bi ser zînê te ve girêdim û te bi saxî bibim cem Şah. Bila te serjê bike. Gava we xwîna Sîyavûş rêt teştê, hûn ji Hurmuz netirsiyan!” Şûre Hindê di dest wî de bû; bi rewşeke hêç û serxweş derket holê. Qêrîn ji Surha û pêlewanên Tûranî çû, halan di xwe dan. Feramûz ha ku nedît, Surha li rex wî peydah bû, mîna ji bin erdê derketibe. Ew gav kurê Ristem bi destekî wî girt, bi destê din jî kembera wî pihêt girt, kişand û ew ji ser zîn avêt xwarê. Surha li erdê, ew li ser zîn bi zeqema sitû girt û ew anî qerargahê. Ala bavê wî ji dûr ve dixuya. Dengê hêlanên pêşewayan dihat. Ristem, di wî halê perîşan de Surha dît, lawê xwe pîroz kir û bang li şervanan kir:

“Binêrin û bibînin! Kesê ku bixwaze bibe pêlewan û serok, divê berî her tiştî wêrek û zîrek be, çeleng û xwey esl be. Ger ev xawênî pê re hebin, ew dê karibe rûyê erdê li bin piyê xwe bike merşik! Çima? Karê êgir tenê şewat e, ne tiştek din e! Pola hetanî li kevirekî nekeve, çirûskên êgir derdixe?”

Li ser milê xwe zîvirî, li Surhayê ku girêdayî bû nihêrî, ew gav Sîyavûş dibîranî. Di spîçka çavê wî de xwîn, lê di ya çavê Surha de zaferan dixuya. Barîn jê çû, tuk ji devê wî belav bû:

“Rakin xencer û teştê,

Zûka wî bibin deştê,

Bila bav pê biêşe û binale,

Bi zare zar derkeve geştê!”

Tûs bi çengurê kurê Efrasîyab girt û bir. Lê belê Surha sitûyê xwe xwar kir û xwe belengaz kir:

-Ez ketime bext û namûsa te! Tu min vê carê efû bike! Tu dê bo çi min bikujî? Min çi sûc kiriye? Sîyavûş hevalê min bû. Min nedixwest ew bêk^tin. Tu tola wî ji min hilneyne. Bi Xwedê, ez li ser cesedê wî pir giriyam...

Dilê Tûs bi van galgalan tenik bû, gunehê wî pê hat. Ji wur zîvirî û ew dîsa bi şûn de anî cem Ristem û got va ye Surha wuha dibêje. Lê belê biryara Ristem bi tund bû, rika wî kûr bû: -Na. Çawa ku bavê Sîyavûş derdê lawê xwe kişand û hêja jî birîndar e, divê Efrasîyab jî bi kuştina kurê xwe biêşê. Bila dilê wî jî biperite. Qey ji me xwîn diçe, ji wan av? Bila ew jî bi ser kurê xwe de binale. Jixwe ji bavê xerab zarokên xerab çêdibin. Kî dizane? Heye ku ev kur, di pêşerojê de bibe bela serê me! Gava bavê wî Efrasîyab, Sîyavûş li erdê dirêj kir û ew di xwînê de hişt, dilê wî qet pê neşewutî, bila zanibûna ku rojek wuha wê were pêşiya wî jî! Dunya, dunya keysê ye. Ez sond dixwum bi sonda temam, bi serê Keykawûsê Keyanî, hetanî ez li ser rûyê vê erdê bim, ji Tirkan, paşa an jî kole, ez kesekî zindî nahêlim! Kî ji wan têkeve destê min, ez dê serê wî jêkim û eniya xwe jî naqermiçînim.

Ristem, êdî bawerî bi Tûs neanî, bang li birayê xwe Zuware kir û bi pêçiya xwe cîh nîşan da. Zuware lezand, leganek û xencerek anî û Surha teslîmî du leşkeran kir. Wan ew li wur dirêj kirin û serê wî jêkirin li pêş çavê pêlewanên îranî.

Xwîna wî herikandin leganê. Paşd, Ristem cesedê Surha, serserkî bi darê ve daleqand. Ji qirika jêkirî hêdî hêdî xwîn niqutî ser axa sar.

Tûranî dîsa têkçûn. Piştî kuştina Surha, tirs ket nav wan, hemî reviyan. Dotira rojê, li qesra Efrasîyab, rêvebir û qumandar li hev civiyan, rewşê şirove kirin. Efrasîyab piştî kuştina kurê xwe, wuha got:

-Êdî ji min re, ji bilî zînê hespê û meydana cengê cîh û war nema!

Art^ş civand, yek bi yek li nav çavê fermandar û serbazan nihêrî gava wuha axifî:

-Xew jî ji me re heram e. Rabin, zerxên xwe li xwe bikin. Roj, roja tolhildanê ye. Peya û suwariyên cengê, gava dengê boriyan bihîstin, êdî nikarin bisekinin. Di pêsîrtengîyê de fikr û raman namîne. Em dê dilê xwe bi kîn û inyadê dagrin. Wan ji pozê rima xwe re bikin nîşangeh.

Li ser fîl texterewan bincîh kiribûn, Padîşah ji jor ve bang

dikir.

Leşkerek li meydana cengê, devê xwe bir ber guhê Ristemê Zal:

-Efrasîyab, weke geştiya ser bahrê tê! Xuyaye ku neynokên xwe tûj kiriye!

Ristem got:

-Ji Neynokdirêj dijwartir nîn e. Paşî bi xêr!

U bi destê xwe nîşan da, leşker bi carekê re serî rakirin û ala Kawa dan pêşiya xwe. Ezman, ji biriqandina şûran polayî şîn dikir. Ji alî din ve, di artışa Tûranê de Barman, bi gurmijîna Tirkan re xwe da alî çepê. Pisporê şerê şûr Guhrem bû, ew li alî rastê ma û Efrasîyab jî, mîna her car li navendê cîh girt.

Ristem li hember wan dixuya. Li pêşiya wî Feramûz û li du wî jî Zuware hebû. Li çepê artışa Îranî Guhderz û Hêjîrê Birca Spî (ku êdî ew hatibû

efûkirin) hatibûn hilbijartin. Gîw û Tûs jî, bi def û borî û zengilan, li alî rastê bûn.

Hore hor ji Ristem diçû, çekên xwe hilgirtibû mîna berê. Hêrsa wî ji pozê wî diavêt. Rim di ber hev de hingiya xilbe bûn, te xwelî bireşanda li erdê nediket. Ezman jî bûbû pişta pilingê. Hewa bûbû mîna çiyayekî hesinî. Li ser jî kumzerx û kumzirîç hatibûn vegirtin. Serê ala Kawa digihîşt nava ewran.

Pîlsemê birayê Pîran, bi sê denga gazî Efrasîyab kir, got xeman nexwe, fikaran neke, roj roja min e. Ger tu hesp û zerx, rim û şûr, xencer û gurz ji min kêm nehêlî, sonda min bi navê te yê pîroz, ez dê şer bikim bi pêlewanê Nîvroj, bi Ristemê Zal re, di nêzîk de ez dê gurzê Sam û serê neviyê wî ji te re diyarî bikim.

Dil û berga Efrasîyab, bi van fortên Pîlsem vebû. Wî jî wuha got:

-Ya şêrê bi nav û deng! Haya te ji te hebe! Ew Qelafetfîl xwey dek û dolab e, zora te nebe, te bêkeys nexîne û hêsîr negre. Ger tu sonda xwe bincîh bînî, tu dê dunyê ji zulma wî azad bikî. Gava tu vegerî Tûranê, mohr û kursî, şûr û gencîne hemî wê di bin fermana te de bin. Qîzek min ezep maye, ji Frengîs biçûktir e, ez dê wê li te mar bikim. Tacê min jî nelazim e ji min re! Bila di oxira te de be. Ji axa her du welatan, ji erdê Îran û Tûranê, ji sê paran yek wê ji te re be.

Hêja gotina Efrasîyab xelas nebûbû, Pîran gahvek derket pêş, bi şewata dilekî dilînî axifî:

-Birayê min dîn bûye, har bûye! Wê xwe bide k^tinê! Kêliya ew li hember Ristem derkeve meydanê, wê serê wî

bigindire ser axê. Ew bdhiş e û kor e, pdşiya xwe nabîne. Gotinên wî hemî pezn û fort in.

Pîlsem li kekê xwe vegerand:

-Keko nabe. Welleh nabe û Bîlleh nabe! Ser jê bibe û goşt biperite jî ev Pîlsem dev ji şer bernade! Ez ne mêrê galgalan û pezna civatan im. Bi bextê te sond dixwum, gava ez bi bavê Feramûz re cengê bikim, tu serê xwe natewênî û şerm nakî. Min li pêş çavê te çar pêlewanên Iranî neda erdê? Ez wê demê xişîm bûm. Lê niha?

Padîşah bawerî pê anî, jê re hespekî baş deranî. Şûr û gurzê giran, keftanê zerxîn û kumzirîç jê re anî. Pîlsem mîna şêrê har tozê ji erdê hilanî.

-Ka kurê Zal li ku derê ye nîşanî min bidin? Bila serê xwe ji min re derxe!

Dengê wî gihîşt Gîw. Kurê Guhderz şûr kişand. Ristem dest avêt şûre wî û nehişt, got "Bona Tirkekî beradayî destê xwe nexe xwînê." Lê belê Gîw guh neda wî. Ew gav Pîlsem fersend dît û rim lê xist, piyê Gîw ji zengûyê filitî. Feramûz xwe gihand wî, bi şûre xwe li rima Pîlsem xist û kir du qet. Derba duemîn avêt kumzerxê wî, lê belê kum zexm bû, şûr di desta de şikest, qevda şûr di dest de ma. Ristem li wan temaşe dikir. Du pêlewanên Iranî bi Pîlsem nikarî bûn. "Ji nava Tirkan pêlewanekî mîna Pîlsem heta niha derneketiye" got di dilê xwe de; "Heke were perwerdekirin, wê kesek pê nikaribe. Lê heke ku ew ji heddê xwe derê û bi min re bi pillê bileyize, ew gav wê ecelê wî nêzîk bibe."

Ristem bang li şe^a^n xwe kir:

-Bila kesek pê navê pêş. Di cîh de rawestin! Ez dê sihêtiya Pîlsem bikim, ew biceribînim. Ka hela kî ji me jêhatî ye!

Rim hilanî û lingê xwe li zikê Rexş şidand, caniyê piştsor hema beziya û dûv rep kir. Ristem nav di xwe da:

-Ho Pîlsemo! Tu min nas nakî? Tu dixwazî bi hilma xwe ya germ min jî bişewutînî? Bizanibe ku ev şere te yê herî dawîn e. Tu careke din zînê

hespê nabînî. Çimkî, tu dê niha derba tîmsah bixwî. Lê dilê min bi xortaniya te dişewute lawo, tu heyf î!

Rexş, dîsa tox û box bû. Hîrîn pê ket, dîsa rabû ser her du pîyên pêş. Ji tafilqeda da rimek bi lep Ristemê Zal ketibû, hetanî ser mil bilind kir û ji Pîlsem re şand. Rim li nîvê mazmazka pişta birayê Pîran ket, ew ji ser zîn daweşand jêr. Bi vê yekê nesekinî, hema bi çengurê wî girt û mîna teyrê baz ku çivîka mirî hilîne, bi nikulê xwe bifirîne, ew hilanî û bir li navenda artışa Tûraniyan danî. “Ha ji we re! Meytê xwe li kefenekî zer bipêçin. Çimkî ^ê wî bûye balîcan!” got.

Pîran bazda ser meytê bira, nihêrî ku wa ye hêja dinale, di ber sikratan de ye, lê belê xelasiya wî nîn e. Li ber serê wî rûnişt û giriya:

-Min negot berê rimê nede Ristemê Zalê çavşîn e,

Ew’ê te bikuje, serê te ji nava gewdê te hilqetîne...

Piştî kuştina Pîlsem, deng bi her du hêlan ket: “Lêxin! Bikujin! Rim bavêjin! Tîr bireşînin! Şûr bihejînin! Wa ye direvin; herin wan!” Tewer car caran dengê çêran jî dihat: “ez di tirba bavê we de birîm, hûn çi sekinî ne?”

Axê, di bin simên hesp û fîlan de axîn dikir. Rondikên çiyayan ji xwînê bûn. Avên sor diherikîn di cuhukan de. Ji xume xum, gurmîn û zirmînê ezman jî diqilqilî.

Ji meydana cengê tozeke reş û tarî bilind bû û li hev geriya labîrent çêkir. Mîna ewrekî reş çarhawîrdor xist bin bandora xwe. Çav çavan nedidît êdî. Şervanan hevalên xwe û neyaran ji

hev nas nedikirin. Roj bi şevâ guherî bû. Efrasîyab lewma bang kir:

-Şerûd û cengawerên min! Taliha me çep vedigere. Ger hûn ji dil û can vî berî dernexin serî, ez jî nema dikarim şer bikim. Divê em mîna pilingan

rrîşî her alî bikin. Lê ez êdî we nabînim! Kemîn bavêjin prşiya wan! Riman hildin û bi pozê riman pêşiya rojê vekin bila ronahî were ser me!

Efrasîyab xwe negirt, ji navenda ab^ê derket û bi dilekî birîndar û rikgirtî hucûm bir aliyê Tûs. Tûs ji ber wî reviya. Bi helke helka devê xwe, çû cem Ristemê Zal, got “Ya sitar! Ya sitar! Ka çare ji me re bibîne! Ya na wê Tirk biserkevin, em dê têk herin. Alî rastê hilweşiya, derya xwînê pijiqî. Ala Iranê ket nav piyan."

Piştî vê gotinê, Ristem ji navenda koma leşkeren Iranê derket û Feramûz jî tevî leşkerên dora xwe da dû. Xwe gihand nav Tirkan. Niha li hember wî rêzek parêzvan mertal bilind kiribûn. Xisim û merivên Efrasîyab wula dipan. Ristem bi alîkariya Tûs û Feramûz ket nava wan. Gelek ji wan kuşt, gelek jî birîndar kir. Efrasîyab, ala Kawa li ber xwe dît. Fam kir ku Ristem tê bi ser wî de. Nesekinî û tavilê piyê xwe li zikê hespê xist û ajot ser Ristem. Lê belê pêlewanê Qelafetfîl dizgîna Rexş serbest berda. Ew gav Efrasîyab, serê rima Ristem ku mîna pelê dara biyê spî dikir di kumzerxê xwe de dît. Belê, rim mîna derzîya ku di caw de here, kum qul kir û tê de çû xwarê. Efrasîyab jî bersiva vê yekê bi rimê da, serê rima tûj di kembera Ristem de çikand. Lê belê rim çerm qul nekir. Bavê Feramûz, îcar rimê bi ser hespa bin wî ve şand. Hesp di cîh de ket û cehimî. Efrasîyab li erdê ma. Birîndar bûbû. Ristem çû ser, dest avêt kembera wî. Hûman ev yek bi çavê xwe dît, lewma ji cîh

pengizî û keys li pişta Ristem anî, gurz lê xist. Hetanî Ristem lê zîvirî, wî hefsar bada, çerx bû û xwe dûr xist.

Pişta Ristem bi wê derba Hûman êşiya, dev ji Efrasîyab berda. Berra ser Hûman da, lê negihîşt wî. Efrasîyab carek din ji destê Ristemê Zal filitî bû.

Dengê şingîna Şûr û gurzan, halanên pêlewan û şervanan li wan çol û çiyayan dengvedida. Mîna ku erdhejek li bajarekî ketibe û gel, bi qêrîn û hawar vir de wur de bazde, terq li elaletê ketibû. Tûs, di nava vê hêwurzeyê de xwe gihand cem Ristem. Li hal û wextê wî, li birîna pişta wî pirsî. Ristem got:

-Wuha ye. Gava ji destê mêrxasan gurzên giran dibarin, ne kevir û ne jî sindiyan xwe ranagre. Lê belê gurzê ku Hûman li pişta min xist, mîna mûmikekê jî li min tesîr nekir.

Şerekî din bi vî teherî xelas bû. Lê dijminiya nava Iranî û Tûraniyan bi dawî nehat. Axa wê deştê bi rengê sefranê guherî. Nale nala birîndaran dihat. Simên hespan di xwînê de dibiriqîn û nal boyax bûbûn di rengê aqût de.

13.

Piştî kuştina Sîyavûş, jina wî Frengîs jê bi hemle mabû li mala bavê. Efrasîyab nehiştibû ku qîza wî vegere Iranê mala xinamiyan. Roja wê hat, Xwedê kurek da Frengîsê, navê wî Xusrev danîn. (Piştre hin kesan wê jê re bigotana Kirûş, li hin welatan jî bi navê Xusro wê bihata nasîn.)

Roj ji pişt çiyayan serê xwe derxistibû û tîrên aqûtî bi ser reşahiya şevê de hêdî hêdî reşandibû. Ristemê Zal, Pêlewanê Cîhanê rawestiya, lerizî, fikirî û li der û dora xwe mêze kir. Di

dema biryarê de her wuha dikir. Kûr diponijî, hesabê pdşî û paşiyd dikir. Carna li ser totikan rûdinişt û li axa ber xwe dinihêrî.

Biryar da; wê artrş derketana rê. Sedemî kuştina Sîyavûş ya bi wê sosreta giran, hêja rondikên çavê porspî û pêlewanên Îranî neçikiya bûn. Malûm e, her du dewêl, hev û din raçavî dikirin. Efrasîyab di demek kurt de nûçe girt ku wa ye Ristem bi leşker û xêbet û pêlewan berê êlê dîsa daye Tûranê. Ket heyecanê, mîna her car qolincî bû û talerzê girt nava wî.

Artışa xwe şand qeraxa derya Çînê, û dû re jî derbasî wî aliyê deryayê kir. Ew gav ji Pîran pirsî:

-Min bihîst ku kurek Sîyavûş ji Frengîsa qîza min çêbûye. Ka hela behsa wî bike? Heke ev xeber rast be, roja ku Ristem pê bihise, ew dê lêwik birevîne û bibe Îranê, wê têjika wî bêbextî li cem xwe mezin bike, wê tacekî bide sera û wê ew li serê me bike padîşah. Têjikên mar bê jehrî nabe. Qaşo neviyê min e, lê dîsa jî ez jê ditirsim. Nizanim çima? Rabe, lez bike, here wî kurikî bîne û bavêje avê.

Pîran li hember vê yekê derket:

-Nabe mîrê min! Tu dê çawa zarokek şîrmijî bikujî? Bona kuştina lêwuk lez meke. Ez tedbîrek wulo difikirim ku, gava tu bibihîzî, tu dê lê şaş bimînî. Tu dizanî em dê çawa bikin? Em dê wî bînin cem xwe, bila li bajarê Xotenê bimîne. Di bin baskê me de wê mezin bibe. Herê haveynê wî genî ye, lê belê ew bibe ar jî, wê tenê karibe xwe bişewutîne.

Padîşah guh da Pîran, li gotina wî ponijî û got:

-Tu rêberê min yê oxirê û qenciyê yî. Gotina te rast e. dereng nemîne, here wî bîne!

Pîran ji kêleka wî rabû, niwînerek anî, ew li hespê suwar kir û berê wî da cîhê Xusrev lê dijî.

248

Niwîner çû cem zarokê nuhfambûyî. Jê re got “Lawo, rabe papûça xwe têxe piyê xwe, ez dê te bibim cem kalikê te Efrasîyab. ew niha li bajarê Xotenê ye, tê jî li wur kêf bikî, ew der xweş e, kalê te ji te gelekî hez dike.”

Lê belê kurik ji niwîner tirsiya, zarok ji awurên zilaman fam dikin, pê nexapiya, bazda çû himêza diya xwe. Jê re got:

-Dayê, yekî mêvan hatiye, dibêje ez dê te bibim cem kalikê te, bajarê Xotenê. Ka tu bêje; ez pê re herim, an na?

Frengîs kûr ramiya, dudilî bû û bi vê bêbiryariyê qilqili. Teqlê xwe dan ber hev. Di dilê xwe de got "Ger ez lêwuk neşînim, wê bavê min bixeyide, nema bi min re têkilî datîne, wê beje tu çûyî ser exlaqê Îraniyan, te mala bavê xwe ji bîr kir. Lê ger ez wî bişînim, tirs û weswese li ser dilê min e, Tûranî ji me hez nakin û kula Keyaniyan di dilê wan de ye, wê bêjin ev ji nesla Kawûs e. Ditirsim ku xerabiyê bi kurik bikin." Ji kurê xwe re wuha got:

-Lawo, ez te tenê naşînim nav wan. Ez dê bi te re werim.

Bi hev re derketin rê û çûn. Di bajêr de pêşî berê xwe dan mala Pîranê Weyse. Gelekî kêfa Pîran ji wan re hat, bixêrhatin di wan da, xwarin ji wan re anî ser sifrê. Xusra li kêleka xwe da rûniştandin û destê xwe di serê wî da, jê hez kir! Frengîs û kurik li wur hişt, berê xwe da qesra Efrasîyab. Padîşah bîna nûçeya nuh hilanî bû. Gava Pîran çawa ket hundur, wî devê meselê vekir:

-Te wan anî, ya na?

Pîran:

-Ew li mala me ne. Niha xwarin dixwun. Ka fermana te çi

ye?

-Wî nekuje, lê belê ji bona sibehê roj Ristem neyê û ew nebîne, ew li geştiyekr suwar bike û wî bişîne wî aliyê Derya Çînê.

Pîran vegeriya malê. Rabû kurik girt cem xwe û ew bir ber deryayê, li geştiyekê suwar kir û şand wî aliyê Derya Çîne û ew li wur da veniştîn.

Ji alî din ve, Ristem dihat. Hatinek çawa? Cenga man û nemanê dabû ber çavê xwe û bi vê best û zerpê dihat. Serê Sîyavûş yê jêkirî, xwîna wî ya di

teştê de dihat bîra wî, bi vê hêrsê dihat. Hemî se^ş û serlehengên Iranî û Zabilî bi xwe re hilanî bû û dihat. Ji panzdeh saliyan, hetanî pêncî saliyan, mêrên ku destê wan qevdika şûr digirt hemî kiribû leşker û hesp xistibû bin wan û bi ab^ek gelekî girse û xurt dihat. Ya wê hemî Iranî qir bibûna, ya jî wê biserketana. Herba qirkirinê, an qirbûnê bû. Tevî çek û pusad, çadir û fîlên xwe dihatin. Dihatin ber bi Tûranê ve, bi ser ruhê Efrasîyab de dihatin. Dihatin, awurên wan li berbangê bû, aso ji xwe re kiribûn nîşan û armanc. U dihatin, pêl bi pêl dihatin. Iranî û Zabilî, Nîvrojî û Kûhistanî dihatin. Bi piyên hespan dihatin, nal li nalan diketin. Ne mirov, ne êla leşkeran, derya dihat derya! Hemî çavsor û çav bixwîn dihatin. Di bin hîrîna caniyê hêç de, rê li ber wan kin dibû. Dihatin û her dihatin. Sibeh, navroj, êvar, paşşîv û di şeva tarî de nedisekinîn, bêhnberdan ji wan re tunebû. Tîbûn, birçîbûn, nexweşî û xew jî ji wan re nîn bû. Dibeziyan û her dibeziyan dest bi damûskên hespan ve zeliqî, diajotin û her diajotin. Kesek ji wan re nikarî bû bibe asteng û bend. Bajarên li ser riya wan, paşa û mîrê xwey qesr û seray, dev ji malê xwe berdidan û direviyan. Berî ku bigihîjin welatekî, ew der ji tirsa wan xir û xalî dibû. Dibihîstin ku Ristemê Zal tê. Kesekî mil li ber wan ranedikir. Tirs û xof, xetere û heyecan, tatêl û fikar

250

digirt ser dilê wan. Hemî direviyan. Bi jin û zarok, bi pîr û kalan ve direviyan. Mal û eywan, erz û eyal, çek û gencîne di cîh de dihiştin û baz didan. Bajar û gund dihiştin.

Pêlewanê Cîhanê, lehengê Qelafetfîl tev li xêbetên xwe bi vê êri^ê gihîşt hetanî Çîn û Maçînê. Tu pêlewan li hember wî serî hilnanî, tu leşker û tu ad^ş nebizivî. Axa wan welatan hemî dagirker kir. Dor li Bajarên Xita û

Xotenê girt, hukumdariya wan xist destê xwe. Ala Kawa li ser bircê wan çikand. Pel nedilibitî li ber, ba nedihat. Di encamê de bû Padîşahê Tûranê.

Bext û taliha neyarê herdem, dijminê bav û kalan Efrasîyab çep geriyabû û roj lê reş bûbû. Piştî Ristem li ser textê Tûranê rûnişt, li gencîneyên Efrasîyab geriya. Xezîne yeko yeko bi dest xist, cihekî veşartî, tiştekî nediyar nema. Tewlê hespan, xizmetkar û qewraş û cariye, koma zêr û zîvan, tac û textên ji diranên fîl. Kinc û qumaşên hevrîşimî hemî civand û her komek berpirsiyarek da ser. Li leşkeren rawestiyayî zêr belav kir, kêfa wan anî, dilê wan xweş kir.

Pêlewanên hevalê xwe yek bi yek kir berpirsiyar. Her yek ji bajarekî an jî ji herêmekî mesûl bû. Mifta bajarê Çaçê teslîmî Tûs kir û lê wuha şîret kir: “Bal û dêna te bila li ser gelê bajêr be. Ji îroj pê ve, kesê ku navê Efrasîyab bi lêv bike, tavilê serê wî jêke û ^ê wî bike zîyafeta teyr û rawuran. Lê kesê ku xizmetê ji te re bike, qet li nijad û eslê wî nenihêre, weke ewladê xwe pê re bişuxule. Hemî divîyahîyên wî bincîh bîne. Bila kesek ji te mekrûhiya neke, nehêlê ku kesek ji te ezc bibe. Ji riya camêrî û dadiyê dernekeve. Dunya ji kesekî re namîne, rêvebirê herî baş Cemşîd bû, dunya ji wî re nema, ma wê ji me re bimîne?” Piştre berê xwe da cem Guhderz. Tacekî zêrîn, textê rêvebiriyê, gerdeniyek paşayan û guharekî zêrîn jê re bir. Rêvebiriya Sîpancap û Soxutê da wî. Peznê wî ji gel re da:

“Ev padîşahî, ev mohra dadiyê, ev meclis û ev çanda cengê, Guhderz da me, me hîn kir, rê û rêçik şanî me da. Ew bi zîrekiya xwe û bi rewuştî, ji me prşdetir e. Ji maleke têr e û xwey esl e jî. Baweriya min gelekî bi wî tê. Ez bi wî gelekî piştrast im. Lê belê bila baş guhê xwe bide min; ji Sîpencapê hetanî bigre bajarê Gulzerîyûnê hemî gel di bin fermana wî de ye û li vir hukmê wî derbas dibe. Divê kesek ji emrê wî derneyê!”

Dor dora Gîw bû. Gîwê Guhderz, zavê Zal jêhatî bû û cîhekî xweser di nav gel de û di nav pêlewanan de çêkiribû. Ristemê Zal rêveberiya bajarê

Xotenê da wî. Piştre herêma Xîta û Çîxîlê jî xist bin hukumdariya Esgeşê pêlewan.

Di wan rojan de gelê Çîn û Maçînê, hemî pispor û zîrekên xwe li hev civandin û ji Ristemê Zal re nameyek şandin. Di nameyê de bi kurtayî wuha dihat gotin: Em li ser navê gelên vir vê nameyê ji te re dişînin. Tu bizanibe ku em hemî di bin fermana te de ne. Em ji riya te dernayên.

Bi vê êri^a dawîn re, Ristemê Zal deftera cengê girt, dev ji şer û pevçûnê û tolhildanê berda. Dilê wî ket cîh, kesek li dijî wî nema.

Êdî ew û birayê xwe Zuware rojên xwe, gav û saetên xwe bi seydê derbas dikirin. Li wî welatî başok û baz gelek bûn. Ew heta êvarê li pey wan bûn. Rojek ji rojan Zuware Tirkekî ji xwe re kir rêber û derket nêçîra pezkûviyan. Bi çolê ve çû, ji bajêr dûr ket, ji dûrî ve daristanek gelekî xweş û şên dît. Şire şira avê, dengê şalûr û bilbilan ew sermest kir. Gul û kulîlkên rengareng tê de vebûbûn û bêhnek xweş ji wur difûriya. Li nêzîkî daristanê, rêberê wî jê re wuha got:

-Êra tu zanî, ev der cîhê seyda Sîyavûş bû. Wî ji vê nêçîrgehê gelekî hez dikir, Bi rojan li vir dima û li seydê dipa. Li vir bêhna wî derdiket, dilê wî xweş dibû, bergeha wî vedibû.

Zuware li daran nihêrî, bala xwe da rehekan, li ava şelaleyan hesand. Belê bi rastî jî cîhekî xweş bû. Ket raman û xeyalên kûr, ji hespa xwe daket, çavên wî tijî histêr bûn. Başokek bi rê ve girtibû, ew serbest berda, başok basik li hev xist û firiya. Li nav dar û deviyan rûnişt û kûrîn pê ket, giriya. Leşkeren wî li dû dihatin, kêliyekê wext buhurî, nihêrîn ku Zuware nehat û ji çav naxuye. Rabûn, lê geriyan, ew di bin hoşevê de, di bin deviyekî de bi wî halî dîtin. Hêja îske îska wî bû. mîna zarokên ber diwêr digiriya.

Alîgirên wî rewşê fam kirin û lanetê li wî rêberê Tirk anîn, gotin ev sûcê te ye û ew dan ber kulm û pehînan.

Zuware ew gav sond xwar, got ez êdî tucarî dernayêm seydê. Ez dê tenê bi pey kuştina Efrasîyab bikevim. Kar û emelê min wê şer û ceng be. Ji wur rabû hat malê, sekin û tebat nehat canê wî, berê xwe da cem Ristem. Gava çav bi kekê xwe ket, bi dengekî êlî ramana dilê xwe tavilê got:

-Ka bêje ji min re keko? Em hatin vir çi" Bona tola Sîyavûş ji wan hilînin, an bona seydê û kêfê? Madem Xwedê hêz û eql daye te, destê Hurmuz li ser pişta te ye, tu bo çi hêza xwe nîşan nadî, gurzê xwe dernaxînî? Niha Tirk kêfa gurên pîr dikin! Rewşa wan xweş e, hal û wextê wan li cîh e, bi Xwedê li ser çîkê xwe gûzan dişikênin! Te jî guh daye nêçîrê û Sîyavûş ji bîr kiriye. Hezar dewr û dewran derbas bibin jî, ka kesekî weke Sîyavûş tê dunê?

Bi van galgalan birayê wî, tesîr li ser Ristemê Zal hişt. Gotina rast, rast e. Wî heq da birayê biçûk. Kêliya Zuware derket der, Ristem bang li pêlewanan kir û leşkeran civand,

civîn bi wan re çê kir. Rewşa rojevê nirxandin. Biryar derket. Ristem ferman da: Her cîhî bişewutînin û xera bikin. Tiştekî zindî û li piya nehêlin. Talan bikin malên wan. Bila tuxmê Tûranîyan li ser rûyê erdê nemîne.

Leşker û pêlewan,

Şervanên Iraniyan,

Hemî hêç û dînên wan,

Belav bûn li her deran,

Gund û bajar û sûk,

Tevî kirin kavil û wêran...

Ji Tûranê, hetanî bigre Rûm û Saklabê avahî jî nehiştin, hemî xera kirin û hilweşandin. Serê gênc û navsereyan, kal û pîran jî jêkirin, jin û zarokan dîl girtin.

Gelên van welatan li vê qetl û qîtalê behitî. Rabûn lijneyek çêkirin, li hev civiyan bona çare ji vê qetlîamê re were dîtin, ev talan bisekine, ev rewşa awarte xelas bibe. Niwînerên xwe şandin cem Ristemê Zal, jê re gotin:

-Ya mîrê mîran! Em ji Efrasîyab hez nakin. Jixwe berê ji em di bin zulma wî de dinaliyan û em pê re hatibûn emanê. Em naxwazin bi xewnên şeva jî rûyê wî bibînin. Em jî li dijî wî ne û em zanin ku wî gelek xwîn rêtiye. Lê belê leşkeren Iranî jî jîyanê li me kirin kafir kerratî! Ne gunehê wan bi pîr û kokiman û ne jî bi zarokan tê. Zikên jinên bihemle diqe^in. Em di bin fermandariya te de ne. Mafir ku tu xalib î, divê tu xwîna bêsûc û masûman nerijîni.

Dilê Ristem bi wan şewutî, heq da wan, hes û ramanên wan fam kir. Hema li cem wan ferman da, serleşkerek hat li pêş

wî li piya rawesta, bejna xwe li ber wî tewand. Kurê Zal bi dengekî bilind got:

-Ad^ê bikşînin alî Kaçarbaşîyê!

Dem buhurî. Rojekê ekabîr û giregir, porspî û zîrek û digel pêlewan û serleşkeren Iranî li hev civiyan. Gotin “Em li vir qetl û qîtalê dikin, lê belê Keykawûs li Iranê tenê maye, wuha nabe. Heke a niha, Efrasîyab ad^ek bicivîne û bi dizî berê xwe bide Iranê, wê Şahê me yê extiyar bindest bixîne û dîl bigre. Jixwe ku Şah çû, em dê çi bikin? Ew gav em nikarin di ber xwe bidin. Me heta niha hemî bajarên Tûranê wêran û talan kir, êdî bes e. Divê em vegerin cem Şahê xwe û nav welatê xwe. Em li vir, li welatê xerîbiyê di nava xwîn û xwêdanê de çi dikin?”

Ristemê Zal li wan guhdarî dikir û bi erênî serê xwe dihejand. Di encamê de, raman û pêşniyazêya wan mûbîd û serokeşîran rast û li cîh dît. Biryar da, got dema vegerê hat. Ji berriya Tûranê, ew rasta duz keriyên revokên hespan, kole û cariye bi xwe re hilanîn, post û çermên heywanên biyanî û kedî yên cur be cur civandin û li ser pişta fîlan danîn. Gencîneyên Tirkan hemî xistin tûr û cuher û heqîban, karwanên deveyan tijî barên malê paqij kirin û bi xwe re anîn. Şûr û rim. Gurz û xencerên khêrî û destîzîv, tîr û kevan jî bar kirin.

Ristemê Zal, piştî heft salan Padîşahiya Tûranê kir, zîvirî Qela Zabilê, cem bavê xwe Zalê Pîroz. Li ber çoka Zalê ku êdî piyekî wî li dunê, yek li hafa gorê bû rûnişt, hesret ji kezeba kûr deranî. Pêlewanên mîna Tûs û Guhderz û Gîw jî berê xwe dan welatê Persê seraya Keykawûsê Keyanî.

Efrasîyab, piştî ku artâşa Iranê bi paş vekişiya, bihîst ku Ristemê Zal û Tûs derbasî wî aliyê avê bûne, ji cîhê veşartî, ji lana xwe derket. Alîgirên wî yên ku ji ber şûra Ariyan filitî bûn û hêja sax mabûn, dîsa li dora wî civiyan, ewul bi ser miriyên xwe ve, bi ser bajarê wêran ve giriyan û dû re berê xwe dan Behra Genkê. Her cîh kambax bûbû û şewutî bû. Çav pê ketin, li çokên xwe xistin. Ne tac û text mabû, ne gencîne, pelên daran jî nema bûn û ew jî kol û rût bûbûn. Koşk û sera, qesr û qonax weke ku li ber bayê Samî çûbûn.

Efrasîyab rondikên xwe veneşart û ji hevalên xwe re wuha

got:

-Kesên ji me ku ev kambaxî û xerabiyê, vê zulm û zorê ji bîr bike, ew bêhes û bêrûmet û herwuha bêînsaf e. Ji mirovahiyê dûr e. Hevalno! Bila dilê we bi rika tolhildanê tijî be, helbet wê roja me jî were. Pêşîya çi gotibû: Dunya ne salek e û ne carek e. Çerx geh li jêr e û geh jî li jor. Çawa ez Efrasîyabê kurê Pêşeng bim, çawa xelk li min wuha bike! Bila êdî mertalên

we ji we re doşek bin û kumzirîç jî balgîfên we. Em dê berê xwe bidin Iranê. Ya ji me ya ji wan! Çi ji me û çi ji wan! Divê em ezman bi ser serê wan ve bînin xwarê, kevirên heyvê mîna aş^ gêndirî nav mala wan bikin û welatên wan di bin piyên xwe de bieçiqînin. Goştê wan cêtî cêtî û tîke tîke ji hestiyê wan bikin û tev li xwîna wan herî û teqanê çê bikin. Ji çar aliyê Tûranê, ji heçî gêncê mayî, yên ku li pey heyfa bavê xwe bin, ordiyek nuh damezrînin! Haydê! Riyek nuh li pêşiya xwe vekin!

Ji her cîhî suwarî hatin, rim û gurz û çekên din civiyan. Ne weke berê, lê dîsa jî hêzên Tûraniyan, xêbetên wan pêk hat.

256

Efrasîyab da pêş, hemîyan da dû û êri^ kirin. Negotin ev daristan e, negotin berriye û negotin devî ye. Agir bi her deverî ve danîn, kula dilê xwe, kesera berê piçekî derman kirin.

Wê demê li Iranê baran ne dibariya. Ev heft sal bû ku, kesekî ewr bi çavan nedîtibû. Ax bûbû hestî, rûçikê wê guherî bû. Hemî nebat hişk bûbûn, teyr û rawur û kêzik jî nema bûn. Hemî ji tîna miribûn. Avên bîr û kaniyan çikiyabûn. Ne fêkî hebûn û ne jî genim û zad. Lewma xelay destpêkiribû. Gel ji birçîna dimir. Şîr di guhanan û pêsîran de nema bû. Dê weledê xwe diavêt. Gel ji tunehiyê êdî kerixî bû û bê çare bû. Him birçî û him jî şilfîtazî li tuxuban diciviyan; koçerî destpêkiribû.

Ristemê Zalê di van hel û mercan de ji Zabilê hîç derneket. Li Qelê, li ber çoka bavê xwe rûnişt. Tirk bi hêsanî, bê berxwedan û bê astengî ketin nava axa Iranê û hemî cîhî zeft kirin, xistin bin bandora xwe. Dagirkirin ser mîrek û eyaletan.

Dêwê Guhderz, şevekî di xewna xwe de dît ku ewrekî reş û tarî, ewrê baranê ku bi bereketê avis e wa ye ber bi Iranê ve diçe. Li ser belekiya ewran jî melayketek rûniştiye. Ew melayket ji wî re wuha got:

-Hûn dê ji vê tengasiyê xelas bibin. Ev xelay wê bi dawî bibe. Mizgîna min li we!

Çend meh bi şûn de xewna Guhderz rasteqîn bû, baranê got ha ji te re! Brûskê reqandê û li her cîhî bû gilêle. Hingî baran hat, lehî bi erdê ketin. Giya û zad şîn bûn. Buharek xweş bi ser wan ve hat û xelay jî rabû. Ew sal zad lê hat, genim û ceh zêde bû. Daran dîsa guliyên xwe li bar kir û fêkî dan. Bû çîk çîka çivîkan.

Sal û zeman derbas bûn. Dem û çax buhurîn.

Xusrev li Tûranê li cem diya xwe mezin bû. Frengîs li kurê xwe bi hezkirin nihêrî, nehişt tu bela û qeza were serê wî.

Wî bêtirs û bigewzî rakir, xwedî kir. Bejna wî dirêj bû, qelafetê wî jî gir. Bû xortekî bi dest û pê û çeleng.

Rojekê Xusrev ji diya xwe re got:

-Dayê! Min bêriya kalê xwe kiriye. Ez hetanî sê-çar saliya xwe li cem wan mezin bûm. Niha ez êdî ji vî welatî kerixîm û ecz bûm. Her giya li ser koka xwe şîn dibe. Alî bavê min, reha malbata min e. ez dûrî wan im, ka wuha dibe? Ez dê serîkî herim Iranê cem kalikê xwe Kawûs. Mafir ku Tirkan bavê min kuştiye ka ez li nava wan çi dikim?

Frengîs pêşî li vê gotina kurê xwe heyrî ma. Dû re dil nekir ku ew ji cem wê here. Frengîs ji aliyekî de ji Iraniyan ditirsiya, ji alî din ve, jixwe nedixwest ji kêleka bavê xwe biçe welatekî dûr. Wuha got:

-Lawo, ez rebena Xwedê, ez dê çawa bêyî te karibim bijîm. Diya te me, min heta niha te xwedî kir. Min hewqas cefa di ber te de kişand, ji bilî te kesekî min nîn e. Qurbana te me, min tenê nehêle lawo, ez jî guneh im.

Xusrev:

-Dayê, bese ji destê van Tirkan. Ez êdî îdare nakim, tebata min nayê! Her roj xort û sîpeleyên hevalê min qerfan bi min dikin û tan û niçan li min dixînin dibêjin, ka bavê te, qey tu bêbavî. Ez dibêjim hatiye kuştin. Dibêjin kî heyfa wî hilanî? Devê min diqufule. Ew çax êşek digre ser dilê min. Min biryar da. Ger tu pir ji min hez dikî û dixwazî bi min re bijî, tu jî bi min re were, ya na ez diçim.

Frengîs li kurê xwe nihêrî. Ji awurên wî tirsiya. Bawer kir ku ew êdî biryara xwe naguherîne, lewma pir bi pey neket. Got "de tu zanî!" Xusrev diya xwe li wur hişt û derket rê.

Xusrevê Keyanî, kurê Sîyavûş li ser pişta hespê, bi tena serê xwe berê xwe da Iranê. Hat, heta di tuxubê Iran û Tûranê

258

re buhurî. Li bajarekî Iranê bêhna xwe da, çû ji malekê av xwest. Xwediyê malê li vî xortê lihevhatî nihêrî, pirsî "Tu ji ku têyî û diçî ku?" Xusrev got hal û mesele ev. "Ez kurê Sîyavûş im, ji hêla Tûranê têm. Diçim mala kalê xwe Keykawûs." Mazûvanê malê ew gav hurmet û rûmet da wî û jê re xwarin anî. Xusrev piştî zikê xwe têr kir, li wur nesekinî û dîsa qamçî li terkiya hespê xwe xist. Lê belê hatina wî ya Iranê li bajêr û di nava gel de belav bû. Hemîkesî bihîst. Paşê jî, berî ku ew bigihîje paytexta Iranê mala kalê xwe, Keykawûs jî xebera wî hilanî ku bi rê ve ye tê. Kêfa wî hat, rûyê wî mîna erxuwanê sorî kur bû. Bi wê extiyariya xwe ket heyecanê, dilê wî çargopal lêxist. Ji nava cîyan rabû. Roja ku Xusrev ket bajêr, ew bi wî halî

çû pêşiyê. Dilê xwe ji nuh ve vejand, mîna giyayê ku kat bide, reng û rûçikê wî vebû.

Xusrev kalê xwe ji dûr ve dît, ew gav dilê wî şên bû. Tavilê ji hespê daket xwarê û ber bi wî meşiya, çû li ber sekinî û bejna xwe tewand. Kawûs hema ew zeft kir û bi her du milan himêz kir. Dû re pişta wî tepand û bedena wî bi hezkirin mizda. Her du, hêdî hêdî berê xwe dan qesrê. Xusrev li wur perda li ser textê Şehînşahiyê maç kir û di ser û çavê xwe da. Destê kalê xwe jî maç kir, Kawûs ew gav bi destê neviyê xwe girt û ew bir cîhekî xweser ku berê hatibû amadekirin da nişîn. Kêfê di çavê wî dwe stêrk çêdikir. Hema li wur bang li dergevanê gencînê kir got "Zûka Taca Keyaniyan bîne vir. Dergevan bi bazdan çû û tac anî, Xusrev tac maç kir û li ser serê xwe danî. Sê qewraş, di dest wan de zembîlên tijî mucevherat derketin û hatin rex Xusrev, xuşîn ji zêran çû û bi serê wî de kirin di bin vê qêrînê de:

"Şabaş! Hezar caran şabaş ji te re! Şabaş ji wî mirovî re ku te anîye dune!"

Xusrev Tûranê ji bîr kir, di demek kurt de hini îranê û kursiyê Şah bû. Xusrev bû "Key" û ala Keyanî da ser milê xwe. Kesên ji malbata Keyanî hemî civîyan ser hev, hemî li wî kom bûn. Mîna ji mêj ve bû ku li benda wî bûn. Yên ku ji hev xeyidîbûn, li hev hatin, hesûdî û dexesî di nav wan de nema. Hemiyan padîşahê nuh pîroz kirin, hurmeta xwe dan nîşandan. Hukm û rêveberiya wî li her cîhî hat qebûlkirin. Gelekî jê hez kirin, lewma navê wî danîn Keyxusrayê Mubarek.

Qumandarê welatê Nîvrojê, Pêlewanê Cîhanê bihîst ku Kawûs dev ji text berdaye û di dewsa wî de Keyxusrev rûniştiye. Rabû, li Rexşê Belek suwar bû, leşker û pêlewanan jî da dû xwe, gelek diyarî jî li fîlan bar kir û berê xwe da îranê. Zal jî li mal nesekinî, digel êdî kal û kokim bû jî, xwest here paytextê û eniya Xusrev maç bike. Zal da pêşiya ad^ê, Ristem jî digel ala xwe da dû.

Nûçe gihandin Keyxusrayê Mubarek, gotin Mala Zalê tev li ad^şa xwe ketine rê û tên pîrozbahiyê. Ew gav ferman derket ji qesrê, dengê defan bilind bûn, gel civiya û bi leq wî ve çûn. Kurê Sîyavûş tiştek din jî kir; bang li helbestvanê xwe kir, got: “Tu hergav li rex min be, ji min hîç dûr mekeve! Kêliya te Ristem dît, li ser wî helbestan binivîsîne. Kesê ku heyfa bavê min li erdê nehiştiye ew e. Wî bavê min perwerde kir û pêlewanê bav û kalan e. Fermandarê ar^ê û lehengê herdem û hemdem e.”

Guhderz û Tûs û Gîw jî çûn pêşiya Ristem. Gava ala wî xuya kir, leşkeran hesp ajotin û tozê li dûmanê xistin. Her sê pêlewan ji nava wan pekiyan û xwe avêtin pêşiya Rexş. Ji dil û can Ristem himêz kirin, jê re dua kirin. Wî jî pêşî li rewş û tendurustiya Şahê nuh pirsî, dû re jî kêfxweşî di hev dan, pêlewanên bi nav û deng destê Zal maç kirin. Hemî bi hev re

260

hilkişiyan qesrê. Keyxusrev bi dîtina Ristem re kelegirî bû, histêr ji çavên wî bariyan. Ji ser text daket xwarê û dua kir. Ew gav kurê Zal jî erdê maç kir. Şah jê re wuha got:

-Ya pêlewanê ser pêlewanan! Tu herdem bextewar be û bila ruhê te jî ronî bimîne! Ez zanim ku kesê Sîyavûş gihand qada bilind tu yî! Şerya^ me yê zîrek û bi tevdîr jî tu yî!

Keyxusrev ji cem Ristem, meşiya rex Zal, bi destê wî girt û danî ser serê xwe , dû re jî serê wî bi sînga xwe de dewusand. Wexta Ristem bi nêrînek ba^ş li ser Keyxusrev de hûr bû, ew çax Sîyavûş ket bîra wî. Şahê nuh mû û misqal ji bavê xwe bernedabû. Rondik bi ser simbêlên wî ve herikîn. Ji Xusrev re got:

-Ya Şahê Mubarek! Tu ji bavê xwe yê şehîd yadîgar î! Ev tac û text tenê li te tê, tenê tu layiqî jê re. Ev kursî bo te hatiye çêkirin! Meznahiya bavê te, di tevgerên te de dixuye.

Paşê hemî bi hev re çûn cîhê xwarin û vexwarinê.

Di rûçikê Keyxusrev de xêr hebû, piyê wî li axa îranê hat, lewma ew sal baran gelekî bariya û hewa nerm bû, xêr û bereket ket ser axê, êş û elem rabû.

15.

Çile hat, lê çi çile" Berf çokek ket, meha Sebatê jî xedar buhurî. Belekên berfê li berpalên çiyayan û di hewrazan de telp telp dixuyan. Şevek ji şevên Adarê bû, di nava sermaya şevê de bêhna buhara rengîn mizgîn dida. Li dîwana Keyxusrayê Mubarek cıvata pêlewanan xemilî bû. Guhderzî û Tûs, Gustehem û Berzîn, Gurgîn û Xerrat li ser mînderan li hember

paşâ bûn. Malbata Zalê li serî Ristem û li rex wî jî kurê wî Feramûz û birayê wî Zuware digel xwarziyê wî Bijen li kêlek rûniştibûn.

Keyxusrev bi nihêrîna şibakê re serê rêsiya axaftinê vekir: -Gelî camêran, ev şev ji şevên Gîtê Gîsko ye. Bawerî bi buharê nayê. Pêşiya gotiye, meha Sebatê ji meha Adarê re dibêje:

Xuşka Adar,

Bide min du roj û danek xedar,

Ez’ê bi piyê Gîsko bigrim,

Di sergo de bikim xwar!..

Niha van rojan bila kesek neçe seydê. Divê hûn hay ji xwe hebin.

Feramûz li ser gotina wî zêdeyî çêkir û wuha got:

-Mîrê min! Te gotina meha Sebatê bi lêv kir, lê belê ka Gîtê Gîsko çi gotiye, tu dizanî? Gîsko jî di salên wuha xedar û sar de wuha peznê xwe daye:

Tir û tir Adarokê,

Te rî devê bavê Sebatokê,

Gîsko derket buharê Têr xwariye ganglokê!

Netirse paşayê min. Nîrê qeşemê şikiyaye. Wê pirpizêk derên û legleg û hechecîk kilaman bêjin.

Keykawûs li Feramûz nihêrî, di ber xwe de keniya. Dû re li civatê zîvirî:

-Mirovê ku ji alî Ristemê Qelafetfîl ve hatibe perwerdekirin û bi edeb û rewuşt mezin be, helbet wê rûmet û hurmetê jî bibîne. Feramûz torinê Zalê Zêrîn e, ji Malbata Samê Nerîman e. Ji Hindê û Kannûçê, hetanî Sîstanê di bin fermana wî de ye. Feramûz! Xwarzîyê min! Bi mirovên aştîxwaz re

262

cengê meke tucar. Xasma şîreta min li te, parêzvanê feqîr û fuqaran be. Lê belê heval û hogirên xwe ji nav qencan, zîrekan û mêrxasan bibijêre. Pêşiya gotiye: “Ji mêran mêrên baş, yên ku pir nedin pêş û paş!” Ji bona libek tirî mahserakî rast neke! Kesê ku zerara wî negihê te, tu jî pê re hefteheyştê meke.

Ristem dora xeberdanê girt:

-Çend şn^n min jî jê re hene: Lawê min! Bi hêrsê canê kesekî meêşîne. Bila gel ji te hez bike. Gava pirsgirêkek derket holê, pêşîya her tiştî bi zarekî şêrîn kesê li hember xwe bîne rê. Ger nehat rê û ket rikê, ew gav pê re şer bike. Dema te dest bi karekî kir, dawîya wî karî jî biPikirc. Riya

ku kesek tê re naçe, tu jî neçe. Bona çi? Bona ku xelk ji te ecz nebe. Kesên ku li pey heqqiyê û dadiyê digerin, bila dostê te bin. Deriyê xwe ji wan kesan re veke. Li dijî mirovên dilreş û xerab xwe sist neke, ger ew di rojek te ya teng de keysê li te bînin, ew dê li serê te bibin ejderha, tu nema ji wan difilitî. Agir hêja çirûsk be, bitefîne. Ger tu bihêlî gurr bibe, ew gav ew dê dunê jî bişewutîne. Sir û gilîyan ji tukesî re eşkere meke. Dema ku Gurşasb pîr û kal bû, Nerîman dest avêt gurz. Kesek xwe li hember wî ranegirt. Piştî ku kurê wî Sam mezin dibe, cîhê bavê xwe digre, Nerîman jî dest bi şerabê dike. Lê belê gava kalikê te Zal dibe xort û kember girê dide, vêca Sam xwe dide quncik. Tu jî zanî, çaxa ez mezin bûm, bavê min jî çû li mal rûnişt û derê Qela Zabilê li ser xwe rada. Heta niha, mirovê ku li dijî min serî hildaye, ji gurzê min xelas nebûyê. Niha jî dem dema te ye. Ez dê bêhna xwe berdim û rawestim. Lawo, min kurekî xwe kuşt, navê wî Suhrab bû. Mêrê weke wî tune bûn. Niha porê min spî ye. Şîreta min li te, hay ji xwe hebe.

Sitekanên meyê li ser destên meygeran digeriyan. Li ser şerefa Padîşahê Cîhanê qadehan li bin guhên hev xistin, pêkenok

gotin, henekan kirin û keniyan. Ji nişka ve derî vebû û mirovekî kincqetiyayî û rûqirrêj ket hundur. Eşkere bû ku ew şivanek bû. Li ber derî got “Şeva we bixêr!” û derbasî alî Şah bû. Bi dawa kirasê Xusrev ve zeliqî û lave lav kir: “Mîrê min, qurbana te me! Ez ketim bextê te, tu derdê min derman bikî!”

-Çi ye derdê te, tu çi kesî?

Şivan:

-Ez jî ji vir im, Iranî me. Di gundekî de dijîm û heywanan xwedî dikim; şivaniyê dikim. Van rojan dêwek damûskjêkirî musaletî keriyan bûye û hemiyan telef dike. Mîna şêrekî har êri^ dike, sitûyên hespan gez dike û

direve diçe. Mîna ku pûrta wî bi ava zêr hatibe şûşti^, zer e, dibiriqe. Dêwê ku di rengê rojê de ye ji damûskê hetanî dûvikê, xêzikek reş li ser pişta wî heye. Pê û ranên wî mîna yên hespan in.

Keyxusrev baş bala xwe da ş^n û lê guhdarî kir. Ji bav û kalan bihîstibû ku di wê deştê te bi navê Eqwan dêwek hebû berê. Ji şivan re got:

-Berxê min, ez zanim ew ne rawur e û ne cenawur e, ew Dêwê Eqwan e. Tu here karê xwe, ez'ê çare jê re bibînim, tu qet miraq meke.

Dû re li pêlewanan li ba ket "We jî bihîst; dêw ketiye nav garan û keriyan. Ez şêrekî dixwazim!"

Kesekî deng nekir. Şah li Ristem meyzand û hêvi kir ku ew dê rabe piya û derê pêş. Ristem êdî kal bû, lê hêja jî bi bejn û bal bû, ew şîrhelal bû û ji mala Zal bû. "Ferman a te ye!" got pêlewanê bi nav û deng. Belê, tenê ev bêje ji devê wî pekiya. Xusro got "Tu were rex min, gava ez rûyê te dibînim, roja min dibişire. Tu ji me re her hebî û her bijî! Siûda min bi çavê te yê hişyar re dikene. Xwe baş amade bike, ev şer ne şerekî biçûk e,

zehmetiya ku tê bibînî bîne berçav. Xwe jê biparêze. Di be ku ew Ehrîmen be jî!"

Bavê Feramûz, suwarê Rexşê Belek wuha bersiv da: -Mirovê ku tac û textê te bihebîne û ala te bilind bike, bi saya te ji tiştekî natirse. Tu li pora min a spî nenihêre; ew dêw e, an jî ejderhayê nêr e, ew tucar nikare ji devê şûre min yê tûj xelas bibe, wê li ser sînga xwe bibîne xencer û kêr e.

Ne dema seknê bû; Ristem rabû û li ber derî xwe çengî ser pişta Rexş kir, berê xwe da çolê wî cîhê ku şivan lê kerî diçêrîne.

Deştek fireh bû ew der. Sê roj û sê şev li dêw geriya, li dorhêla kerî nobedariyê kir. Roja çaran girekî goştînî derket, lê ne dêw bû çiyayekî

jîndar bû! Pişta wî zerê zêrînî bû, di şik^ kerekî kûvî de bû. Ristem mîna bayê bakur teqizî ser, lê belê nexwest ew bikuje, got ez bi saxî bigrim û bibim cem Sultan çêtir e. Kemend avêt serê wî, lê belê dêw pê hesiya û çiv da xwe û ji ber çav wunda bû. Ristem di cîh de mat ma. Erd qelişî pê de çû, an firiya bi hewa ket, ev çi bû ji wî dêwî? Heyirî ma. Ristem ew gav hêrs bû û pişta destê xwe gez kir. “Ev Eqwan e, ne henek e, divê ez bi xapandin wî bikujim.” Ew gav dêw dîsa derket deştê, Ristem vê carê tîrekî xist kevanê û hesp ajot. Kêliya kevanê lê girt û çav ji ser neneqand û kişand, kambaxo cardin xwe wunda kir.

Ristem bi şev û roj li wê deştê lê geriya, mîna dînekî çolê vir de çû û wê de hat hetanî Rexş rawestand. Ew jî him tî bû, him birçî bû, him jî xwêdan da. Serê wî dageriya ser zîn. Xew jî ketibû çavê wî. Lê dîsa nesekinî, ev geşta wî heta êvarê domiya; roj li ber ava, rast li kaniyekî hat, çend qurt av jê vexwar. Lê ev çi bû? Ava wê mîna ava gulan şêrîn bû! Av da Rexş jî, lê piştî

avê bêtir xewa wî hat. Zînê hespê vekir û ew berra deştâ da, piştre jî serî xist xewê.

Eqwan dît ku Ristem niviya, mîna ecacokê beziya, hat ber û pê girt ew ji erdê bilind kir. Kurê Zal di xewa şêrîn de dît ku bi hewa dikeve, wî got qey xewn e. Li hewa, di nav pencên dêw de perpitî. Şîyar bû, seba ku bi sosretek wuha ji xew şiyar bû, tirs ket nava wî. Di temenê xwe de ewqas netirsiyabû. Di dilê xwe de got:

“Ey wax li min, ey wax li min!

Ez nemînim, xwelî li serê min!

Elweda ji mil û masûlkên min re,

Ji kezeba pola ji hêza min re,

Ji gurzê kalanî û ji rima min re,

Ji şûr û xencera min re,

Ji tîr û kevana min re Bila Efrasîyab dest hine bike,

Kêf bike û dîlanê bigre...

Êdî ne Xusro dimîne, ne jî Guhderzî,

Bila ez nehatama, biteqiyama xwezî,

Ne Tûs wê bimîne, qesr û qonax ne jî.

Ev felaket wê xerabî bîne ser erdê,

Bav'ê birevin, law xwe bavêjin ser dê,

Kî wê heyfa min ji vî hilîne,

Zulm ê zorê rake û aramiyê bîne?"

Dêwê Eqwan tirsa dilê Ristem hesand, lewma qêriya:

-Ya pêlewanê Qelafetfîl! Ka bêje, ez te bavêjim ku derê? Ji xwe re cîh û warekî bibijêre! Te bavêjim nava zinaran, an biheliqînim nava avê?

Ristem berî ku bersiv bide wî, wuha fikirî: "Dunya di destê vî mel'ûnî de ye! A baş ew e ku ez dek û dolabekî lê çêkim. Dêw çi zane bi sond û peymanê, bi soz û îmanê; ez çi jê bixwazim, ew dê li dijî xwesteka min tevbigere. Ez niha bêjim min bavêje nava avê, ew dê min bavêje nava zinar û keviran, wê hestiyê min bişkên û çermê min bi ta'tan ve bizeliqe. Lê ger ez bêjim min bavêje nav zinaran, ew dê min bipengizîne nava avê. Av çêtir e." Bersiv da:

-Ronakbîrekî Çînî wuha gotiye: Kesê ku di nava avê de ruh bide, ew rûyê buh^tê nabîne!

Ez ji te tika dikim hezar caran,

Min navêje nav avê,

Bedena min neke xwarina masî û maran,

Min bavêje nava kevir û zinaran,

Bila şêr û rawur bibînin pencên fêris û qehremanan.

Eqwan mîna pêlên deryayê ku li kaşan dikevin kir fişîn: -Ez'ê te bavêjim nava her du dunyayan da hişê te were serê te! Bila can û ruhê te bi melûlî û belengazî bigevize û neçe dunya wî alî!

Xuşîn ji avê çû, mîna ku zinarekî ji stêrkekê de were xwarê wulo pêlên wê ji hev qelişîn. Tîmsehan êrîşî wî kirin. Şûr pê re bû, tavilê kişand; hemî cirnîs û rawurên avên ji ber wî reviyan. Bi dest û piyê çepê ajneberî dikir û bi yên rastê jî şûr dihejand, xwe diparast. Hêdî hêdî xwe gihand qeraxa avê. Bîstkê xwe li ser pişt dirêj kir û kembera xwe vekir, zerx jî ji xwe kir û bêhna xwe da. Çek û kinc li dora kaniyê raxist heta zuwa bûn,

ew li wur niviya. Paşâ rabû, dîsa kine û zerx li xwe kir vegeriya cîhê ku berê li wur razabû. Lê belê Rexş nedît, ew wunda bûbû. Zîn û gem hilanî da ser pişta xwe û li eaniya belek meyzand. Daket newalan, hilkişiya ser zinaran... Lê bê feyde! Bi vê gerê, gihîşt nava dar û deviyan, cîhê çêra heywên. Şirîna avê dihat û çîke çîka her teherên çûkan. Seyisê Efrasîyab li wan zozanan garana hespan diçêrand û niha li nava daristanekê di xew de bû. Gava bi hîrîna hespan şiyar bû, dît ku mirovekî biyanî wa ye li nava colê revoke kemend diheliqîne û li pey hespekî ye. Hema hilqevizî û bang li alîgirên xwe kir, suwariyan li hev eivand. Ristem li pey Rexş bû, eaniya belek ji bilî nava wê garana hespan tu eîh nedîtibû.

Ristem ew qefalt û zîn danî ser piştê, dizgîn û gem li sera xist lê suwar bû. Ew gav terq li eolê hespan ket û li pêşiya wî beziyan. Suwariyan digel seyisê Efrasîyab bi pey wî ketin. Tîr û kevan jî bi wan re hebûn. Ristem bi dengê nalên wan hesiya, rewşê fam kir. Zîvirî û nav di xwe da:

-Lo lo! Ma hûn zanin ez kî me lo! Ez Ristemê Zal im, kurê Destanê Kal im lo!

Hefsarê hespê kişand, berê Rexş li ba xist. Seyîs dengê wî bihîst, lewma dest bi revê kir, yên din jî li dû çûn.

Ew roj Efrasîyab derketibû çolê, geşt li zozanan dikir, şerabê û haletên muzîkê bi xwe re anî bû. Çavê xwe li seyîs gerand, lê belê ne ew dît û ne jî alîgirên wî û revokê çolê. Ji dûr ve hîre hîra hesp û welaqan dihat, toz rabûbû. Nihêrî ku seyisê extiyarê reben, ziman gazekî ji dev kişiyaye û helke helk bi ser ketiye, wa ye ji wê ve tê. Paşa got "Kuro ma te xêr e, ev çi bi te hatiye mîna tajiya kelox ku ji nêçîrê were tu di hilhijî?" Seyîs got "Mîrê min qet nepirse! Heft xwezî bi tajiyê jî! Ristemê Zal li me rast hat, ket nava eolê hesp û welaqan, eaniyên baş û jêhatî ji

268

nav neqand û ji xwe re bir, me jî rûn di bin pê da û Yellah!" Efrasîyab gava navê Ristem bihîst kûr çû, rojê berê ketin bîra wî. Alîgir û zana û pêlewanên pê re gotin "Ya Padîşahê Mezin! Ez bi teylesana serê te bikim wuha nabe! Divê em hemî li dijî wî dest bavêjin şûr û gurzan. Em rezîlên fîlalemîn bûn! Bila axa Tûranê hemî li serê me be ku em hemî bi yek mirovekî nikaribin!"

Hemî bi pey Ristem ketin, ha li vê newalê, ha li wî kaşî, ev gelî ji te re û ev qot ji min re, geriyan heta ku ew dîtin. Lê belê kurê Zalê şîyar bû, berî ku ew nêz bibin wî tîr û kevan ji mil danî û mîna tavana zîpikê tîr reşand ser wan. Şêst kes kuşt, dû re kevanê danî. Vêearê rahişt gurzê giran û bi nava wan ket, çil zilam jî bi hêza gurz avêt erdê. Efrasîyab ji ber wî reviya. Ristem çar fîlên spî bi dest xist. Kumzerx û kumzirîçên wan parçe parçe kir û dîsa zîvirî ser kaniya ku berê ji wur av vexwaribû. Lê nihêrî ku çi

bibîne! Dêwê Eqwan li wur mexel hatiye! Di ser milê xwe re nihêrî, got "Dîsa tu? Tu hêja ji şer têr nebûyî? Tu ji devê eirnîsan xelas bûyî ne? Lê ez dinihêrim ku tu rihet nasekinî! Eelê bizinê te, diçe nanê ş^n dixwe! De were..."

Gotin di devê wî de eemidî, Ristem kemend avêt nava wî û ew li hev pêçand. Dêw bi xavê kemendê girt û ew ber bi xwe kişand. Ristem bi serîyekî ve û Eqwan bi serê din ve bi kemendê girtin û kişandin. Dêw giran bû, kambaxo ji eîh nedilibitî, lê belê Ristem xwar bûbû, hindik mabû ku ji ser hespê ve bikeve xwarê. Ew gav Ristem bi destê din gurz lê xist. Mîna ku hesinkêrekî çakûç li sindiyan bixe wulo li ser hev gurz lê sar nekir û serê wî kuta. Entîn ji dêw çû. Ente enta wî mirina wî nêzîk dikir. Dû re çend derb jî avête piştê. Mêjiyê Eqwan pijiqî, Ristem ji hespê daket û bi xeneera xerzanî serê wî jêkir.

Vegeriya paytextê, qesra Keyxusrayê Mübarek. Şah ferman da; pêlewanan kum û kolos dîsa xwar kirin, alê li prşiya xwe çikandin, borî û zengilan li ser pişta fîl û hespan girêdan derketin. Leşkeran sef girtin. Padîşah bi kêf û best û şewq bû. Ristem bi dîtina wî re, ji hespê xwe daket xwarê, axê maç kir. Dengê tilîlî û helahelayê olan da.

Keyxusrev got "Ya pêlewanê min î jêhatî! Tu pêlewanê hemdem î. Tu hemdem î! Ji niha û pê ve navê te Tuhemdem e! Te por spî kir, tu mezin î, lewma li Rexşê xwe suwar be! Divê em rûmetê bidin te."

Tuhemdem hespê ku ji Tirkan sitendibû li leşker û pêlewanan belav kir, fîlên spî jî şand axura fîlan.

Ew roj qesrê di gul û sosinan de, di bêhna misk û emberê de xemilandin, heft şev û heft rojan mey vexwarin û li bin dengê rûdê ji xwe ve çûn. "Mîrato pir xweşik bû! Mirov wehma şer jê nedikir! Hingî rengîn bû çavê mirov li ber wî venedibûn. Di şik^ kerekî kûvî de bû. Gava min gurz lêxist,

çavên wî yên spî û lêva wî ya reş derket holê. Kêliya min serê wî jêkir, xwîneke reş pijiqî hewa!” Ev dengê Ristem li meclisa vexwarinê belav dibû.

Du hefte li ser hev, her şev mey vexwarin û qala cengê kirin. Roja heyştan Ristem ji Keyxusrev re got “Ya Padîşahê Cîhanê! Tu îcar îzna min bidî, ez dê vegerim welatê xwe nava zarok û zêçên xwe, min bêriya wan kiriye, ew li mal li benda min in, çavê wan li rê ye. Dîwarê Qela Zabilê min dikşîne û bêhna Zalê Pîroz tê pozê min.”

Di tarîbana şevê de ne stêrka Zuhal, ne Merîx û ne jî Riya Kadiz dixuya. Rûyê şevê, mîna çavê morîyeke reş ji qetranê sewaxkirî bû. Merîxê jî xwe di zikê ejderek qemer û reş de veşartibû. Hemî deşt û mêrg di kirasekî reş de, an jî bi baskên teyrê qaj hatibûn perdekirin. Ezman polayê zengarî bû. Tirs û tenê tirs hebû; Ehrîmen mîna marekî devvekirî li her cîhî pêjna xwe eşkere dikir. Buhar bû, bi hilma wî ya germ terrafa êgir tevî duxanê difûriya û ew derya qetranê pêl dida. Roj westiyabû û çerxa felekê jî ji gerra xwe kerixî bû. Dunya di bin xofeke kûr de dinaliya. Ne dengê çûkekê dihat, ne jî borîna gamêşekî ji axuran. Her tişt û her giyandar di bin bêdengiyeke kûr û bêdawî de aş bûbûn. Ne çiya çiya bûn û ne jî newal newal.

Xusroyê Sîyavûş, di wê tariyê de gelê Qesrê, hemî pêlewan û zîrek û giregiran şîyar kir, meclisa şox û şengê li dar xist û bang li fermandarên ad^ê kir “Werin em îşev şûşeyan li bin guhê hev xin! Ji bona xatirê rûmeta vê dewleta mezin ku serî digihîje Çîn û Maçînê em bi hev re noş bikin!” Ew gav deng ji çengê çû û ev deng li dîwarê qesrê ket, li eywan û şaneşînan belav bû, mîrata çengê kulpîn ji dilê reqsvanan û govendgêriyan anî. Ji dilê pêlewanên civatê jî. Li Ferîbûrzê kurê Kawûs, Gustehem û Guhderz, Ferhad û Gîw, Gurgînê Mîlad, Tûs û Xerrat tesîr kir

û xasma jî li dilê Bijenê ciwan xist. Bijenê xwarziyê Ristem, kurê Gîwê Guhderz jî ew şev hatibû civatê. Di dest wan de şeraba sor ya ji rengê akîkê, li pêşiya wan bergehek xweş, baxên gulê bejî hebûn. Xizmetkar li piya bûn, bêhna

miskê ji porên wan dihat. Nazirê qesrê li rex Şah li piya sekinî bû.

Heke ew gav ji dergevanan yekî derî venekirana û di guhê nazir de wuha negotana, ji vê şeva şahiyê tiştekî cihê wê çênebûyana:

-Çar suwarî hatine ber derî, dibêjin em ji welatê Erman in, tarî ye û serma ye, bila me bihewîne. Karê me bi wî heye, em'ê tiştekî jê re bêjin.

Nazir got:

-Bila werin hundur, derdê wan çiye ji padîşah re bêjin.

Çar peyayên bejndirêj ketin hundur. Ew gav dengê muzîkê rawesta. Mêhvan li ser mînderan bi edeb rûniştin. Keyxusrayê Mubarek got:

-Kerem bikin! Gazin û lomê we ji min hene, an hûn alîkariyê dixwazin? Hûn ji ku ne?

Peyayê serî bersiv da:

-Em xweşiya te dixwazin ya Padîşahê Pîroz û dilsoz! Em ji welatekî din heta vir hatin, em ji Erman in, gazinên me ji te nîn in, lê belê xenzîr li me peydah bûne, ev serê mehekê ye ne zarok bi me ve hiştin ne jî heywên û zevî. Hêviya me tu yî ku me ji wan xelas bikî. Welatê me di tuxubê we û Tûranê de ye tu jî zanî. Darên fêkiyan gelek in û zevîyên me hene ku genim û ceh heta qirikê bilind dibin. Van kambaxên xenzîran li me raweşiyan, ne fêkî dihêlin û ne jî zad. Diranên wan dirêj in mîna yên fîlan. Ger çareyek neyê dîtin, em û zarokên xwe em dê birçî bimînin. Zerara wan bêhed û hesab e. daran ji kok ve radikin û bi wan diranên tûj keviran jî dihêrin. Em'ê ji xezeba wan biçin helakê.

Şah serê xwe tewand, ponijî û dû re bang li civatê kir:

-Ez şêran dixwazim! Kî ji we amade ye ku di alîkariya van rebenan de biçê. Nêçîra xenzîran bi dilê kî ye? Ka pêlewanên pezn û fortan? Ha ji we re fersenda navbelavkirinê! Kesê ku çok biçikîne û bi wan re here, di vegerê de deriyê gencînê jî wê li ber wî vebibe. Dergevano! Ka maseya zêrîn bîne!

Maseyek zêrîn anîn, zîv û zêr li ser reşandin. Xwestek wekiland Şah:

-Qehremanên Iranî! Ristemê Zal ne li vir e, roj roja we ye, dor dora we ye!

Deng derneket, bêdengiya şeva tarî dîsa hukum kir, ji xeynî vî dengî:

-Em leşkere giran bişînin çêtir e. Encax artTş ji heq wan

derê!

Berî Keyxusrev, Guhderz li wî dengî vegerand:

-Ne hewceyî art^ê ye, em dê du pêlewanan ji nav xwe bibijêrin, bila biçin wan xenzîran qir bikin û werin. Bawerî bi êla leşkeran nayê, dikevin kîja welatî ew der di bin piyên xwe de dieçiqînin. Pêşiyan gotiye: Leşkeren bira, divê neçe ber deriyê x^kê.

Şah:

-Belê, gotina Guhderz rast e. Du pêlewan besî wan berazan in.

Kurê Gîw derket pêş. Ewul peznê paşê da “Bila ev qesr ji bilî Keyxusrayê Mubarek tu paşa nebîne. Ez Bijen im, bi can û ruh di emrê te de me. Xenzîr li min! Nêçîra wan çiqas xweş e hûn zanin?

Gava dengê kurê wî hat, Gîw şaş ma; nedixwest ku lawê wî biçe. Daxilî nava xeberdanê bû:

-Na kurê min, tu nikarî Tu hêja xişîm û xam î. Ew berazên hêç wê te lete lete bikin! Wêrekî tiştek din e, zîrekî tiştek din! Jixwe tu riya Ermanê jî nizanî.

Bijen xwe qurre kir:

-Bavo tu têkilî min nebe. Qey tu min newêrek û bêkêr dibînî? Ez di cengê de xort û jîr im, di fikr û ramanan de pîr im, li civat û caxiyan jî mîr im, ez'ê serê wan xenzîran ji cendekê wan hilqetînim!

Padîşah destûra çûndina Bijen da, lê wuha got "Bijen jêhatî ye, lê mixabin riya ermanê nizan e, bila Gurgînê Mîlad jî pê re biçe. Bê rêber jî nabe."

Her du pêlewanan kember li nava xwe pêçan, zerx li xwe kirin, şûr û rim hilanîn, tîr û kevan bi heqîbên hespan ve girêdan û şeva tarî çirandin. Rê û rê çûn, Gurgîn li pêş bû. Gelek xezal û pezkûvî kuştin. Bi sibehê re, derketin nava bax û baxçeyekî ku di bin dengê şalûr û bilbilan de dilerizî. Dest bi nêçîra kewan kirin, bi dilê xwe tûr tije kirin.

Çend roj bi şûn de xwe gihandin wê daristana cîhê xenzîr lê dijîn. Her du hogir ewul agir vêxistin, gelek êzing civandin û kirin kom, zimanê alavê hewayê alast. Ew gav tulumê şerabê vekirin (ew bi xwe re anî bûn), cendekê pezkûvîyekê li ser êgir pijandin. Wextê paşşîvan, dema dengê xwezayê kêm bû, terrafa êgir danî, Gurgîn sermest bû û li cîhê xewê geriya, lê belê Bijen got "Na bira! Ne wextê razanê ye. Kî xafil e, ew kafir e! Divê em pêşî karê xwe bikin, kula dilê paşê derman bikin û razanê heq bikin, bi dilekî rihet binivin."

Rabû piya, bazda nav deviyan û ji Gurgîn re wuha got: -An ji cîh nelive û ranezê, an jî ger tu pir dixwazî, were alî min bike. Here pêşiya avê, gava dengê wan hat rake gurzê xwe. Yên ku ji ber şûre min xelas bibin, bila bi gurzê te bimrin.

Gurgîn çena xwe bilind kir:

-De na lo! Xulamê te û bavê te heye li vir? Me wuha soz dabû hev? Ez rêberê te me, ne ûlilemrê te! Yê ku tûrikê xwe ji zêran dagire tu yî. Te got ez tenê besî wan im. Min heta vir rê nîşanî te da, karê min a niha li vir xelas bû, meliya min bi kevir û das bû! Kumê min li serê min e, bila yê hevalê min bigindire newalê!

Xwarziyê Ristem bi vê gotinê hêrs bû. Damara Mala Zalê ew girt, serê xwe zîvirand û xwe berra nav daristanê da. Tîr li pey hev şand, yekî avêt û ya din da ber pozê xwe. Gelek xenzîr kuşt. Carekê jî keys li yekî anî û da ser piştê ku ew bigre û hûr û rodiyên wî bi xencerê birêje. Lê belê ew gav xenzîrekî din diran di zerxê wî re kir û zerx çirand. Bijen fitilî ser û ^ê wî kir du wesle. Yên mayî jî reviyan, Bijen li dilopên xwînê ku ji xenzîrên birîndar dinuqutî nihêrî. Piştre çû ser beratan û serê gelekan jêkir bi zînê hespê ve girêda bo di vegerê de baweriya Şah bi xwe bîne.

Bijen li Şevreng suwar bû û hat cem Gurgîn. Kurê Mîlad li bin darekî rûniştî bû, li Bijen temaşe dikir û difikirî. Nihêrî ku Bijen hat û seriyê xenzîran jî bi zînê hespên wî ve ne, hesûdî di dilê wî de vejiya. Dexesiya wî di rûyê wî de gazî dikir! Ev rewş xerabiyê jî xist dilê wî. Şeytaniyek fikirî, xwest ku dekekî li hevalê xwe çê bike, bobelatekî bîne serê wî. Lê çawa?

Her du cardin li ser sifra xwarinê û şerabê rûniştin. Kêfa Bijen li cîh bû, henekan dikir û peznê xwe dida. Carna qerfan bi Gurgîn dikir û ew bêtir didexisand.

-Çawa bû? Te hunerê min yê cengê eciband? Kesek dikare weke min şere xenzîran bike?

Gurgîn:

-Na. Xwedê zane kesek nagihîje te. Min di temenê xwe de heta niha kesekî mîna te şervan û xwey huner nedît.

Dilê Bijen bi vê gotinê bêtir nepixî, lê nizanîbû savar bikevir e. Çend qadehên din jî ji hev re bilind kirin û bi ser gewriya xwe de kirin. Gurgîn:

-Heyran, Welleh bi rastî jî tu zilamekî şerûd î û mêr di ser pozê te re jî nîn in. Tu guhê xwe veke, ez'ê tiştekî bêjim niha. Ez bi Ristem û Gîw, bi Gustehem û Tûs re heta niha gelek caran hatime vir. Pir serpêhatiyên me li vir çêbûne. Li tuxubê Tûranê cîhekî xweş heye ku meydana kêfê ye. Li aliyekî ava cemidî diherike, li alî din qîzik hene (yê Tirkan) û kew û kerro jî! Kuro buhuşt e buhuşt! Ne pir dûr e jî, ji vir heta wur du roj dajo bi piyê hespê. Tu nizanî, deşteke gelekî xweş e, her cîh dar in. Bax û baxçe tu bipirsî, jixwe bêhejmar in. Kulîlkên renga reng, dilê mirov dihilpetikînin. Ava kaniyan şêrîn e mîna ava gulan. Her tişt bi dilê te. Gul bê bilbil nîn in, şalûr jî yasemînan dixemilînin. Lê ji kewên gozel re nabêjî çi? Bijeno lawo, ez te nas dikim, tu bêkeçik nasekinî. Min bihîstibû ku tu bi xalê xwe re çûbûyî şere Ab û Neynokdirêj, te dilê xwe xistibû xuşka wan. Bi Hurmuz sond dixwum, keçikên wê deştê ji huriyan jî xweşiktir in. Hema digerin û rûbiken in. Qîzek Efrasîyab jî heye, navê wê Menîce ye, ew jî tê wur. Lê li gor salixê saloxdanan Menîce ne qîz e!

-Lê çi ye? Qey jin e?

-Na na! Ne wusa, ew hurî ye, ne ji wan keçikên tu zanî! Ser bextê min, gava tu wê bibînî, tê zimanê xwe bixwî û til û pêçîyên xwe gez bikî lo! Va ye gotineke min ji te re got. Şewqa rûyê wê li ser pelên dara dibiriqe. Tevî sed cariyeyan tê wur, kon vedigre û şerabê vedixwe. Keçikên Tirkan xweşik in. Hinerkên rûyê wan sor e, çavên wan biçûk û nêrîna wan

mexmûr e, birûyên wan kişandî ne. Bêhna çi ji lêvên wan tê tu zanî?

-Qey te tam kiriye?

-Na na. Tu nahêlî ez xelas bikim, bêhna gulan û bêhna şeraba sor ji lêvên wan tê. Rabe em herin wur. Ger em pihêt bajon û qamçiyan li pey hev li hespan bixin, dibe ku di rojekê de jî em bigihîjin wê deştê. Gava em gihîştin deştê, wê dil têkeve buh^tê!

Xwîna Bijen keliya, dilê wî çargopal lê xist, kulpîna wî diçû Gurgîn jî. Rojên berê hatin bîra wî, tolaziya wî serî hilda, “Hema rabe em niha herin!” got bi lêvên lerzokî.

Rabûn, bertengan şidandin, pê xistin rikêban. Roj û şev nesekinîn, ajotin, bêhn li hespan çikandin, nav ranên wan kef da. Rojek û şevekê xwe gihandin wî cîhê dîlan û geştê. Li wur bêhna xwe dan û paşê jî dest bi nêçîrê kirin du roj jî wuha buhurîn. Roja sêemîn Menîce hat û bi qîzikên hevalê xwe re li wê deştê venişîn. Çil deveyên barzêr û barzîv jî bi xwe re anî. Fîstanekî bukînî li Menîce bû, Gurgîn ni’çand Bijen, ew şanî da.

-Ez’ê li nava koma wan karxezalan binihêrim, kîjan xweşiktirîn be, ez’ê bibijêrim û ji xwe re bînim, got Bijen gava taca Gîw da serê xwe. Pirtikê Teyrê Hûma jî ji bîr nekir ku di ber tacê re biçikîne. Qatek cilê ji qumaşê Rûmê li xwe kir, Şevreng zîn kir û gustîla pêlewaniyê jî xist pêçiya xwe.

Gurgîn li wur ma. Bijen çû nêzîkî wan, li wur xwe di nava daran de veşart. Pitîna dilê wî bû, hindik mabû ji qefesa dilê wî mîna çûkekî bifire. Li nava konê Menîce nihêrî. Raçavî kir, dît ku wa qîzek derket, lê ne mirov e, çira ye û di neve kon de vêketiye! Dilê wî bi yek nêrînekê bi heft dilan pê ve hat girêdan û ketêkê. Rûd û çeng li ber hev dibedilîn û dar direilîn bi kulpîna dilê wî re. Deşt jî pê re. Ji ser pişta Şevreng daket û meşiya bin

dareke biyê, hespê xwe pê ve girêda. Li wur rûnişt û xays ma li wan keçikan nihêrî. Ew çayir û mêrg ji xweşikan xemilî bû. Eql û îzan di serê wî

de nema. Kûr çû di nava xeyalan de; tazî bû. “Gelo gelo! Ez’ê çawa qîza Efrasîyab têxim ber vî dilî?”

Hêja wuha xwezîya xwe dianî, Menîce ji bin kon derket, weke her car biskên xwe li ba xist, ji pêş çavê xwe da alî û li dora xwe nihêrî bi nêrîna herdem ya qîzên xama. Ewul hespekî zînkirî bi dara biyê ve bala wê kişand. Dû re zilamekî bi qalpax. Kincên wî yên ji qumaşên Rûmî ji dûr ve xuya kir. Qîza Efrasîyab fam kir ku ew ji maleke mezin û xuyanî ye. Awur li ser wî zeliqand. Li çolê û xortekî Iranî! Miraqa dilê wê jî zêde bû û keliya.

Dîsa xwe di bin kon de wunda kir. Bijen ma li bin darê. Menîce li bin kon bang li pîrika xwe kir û ew şand bin dara biyê.

-Ka here binihêre, hîn bike ew xort kî ye,

Ew perî ye,

An Sîyavûş e ji mezel rabûye,

Bêje Menîce qîza Efrasîyabê Bavpêşeng pirsiye:

Bona çi tu hatiyî û kî te şandiye?

Ev çend sal in ez têm vir, lê min te nedîtiye,

Ger dilê te heye, te hez kiriye,

Were cem me, bi me re bileyize bi biratiye,

Bike kêf û seyran li bin konê Erebî ye.

Pîrik rabû û çû cem Bijen, gotina Menîce jê re bi lêv kir. Rûyê Bijen sor bû, te fîtik lêxistana wê xwîn jê bipijiqîyana. Ew gav tîra eşqê li kezeba wî xist û di alî din re avêt. Lerizî, lê bersiva xwe kêm nehişt:

278

-Ji wê re bêje ez ne Sîyavûş im, ne jî perî me,

Ji welatê rojê me, bi eslê xwe Iranî me,

Ji wur heta vir, bo nêçîra xenzîran ez hatime,

Navê min Bijen e, kurê Gîwê Guhderzî me.

Welatê Ermanan bişewute li ber palî,

Min xenzîran li wur kuşt li çarkenarî,

Gava min we û ev deşta xweş dît,

Dil vêket, helwesta vegera min guherî.

Bijen got, xaltîkê ez dixwazim qîza Efrasîyab bibînim. Ger tu alîkarî bikî û dilê min xweş bikî, ez'ê taca xwe ya zêrîn û kemberê tevî cotek guhar ji te re diyarî bikim.

Pîrikê bi kêf rabû, lezand hat û ev yek ji Menîce re got. Peznê kurê Gîw li cem wê da. Menice carek din ew bi şûn de şand, got "Here bêje, bila nesekine were, canê min û xwe ronî bike..."

Bîstkê bi şûn de Bijen xwe gihand bin çadirê. Kembera zêrîn li piştê bû. Menîce gava çav pê ket ew himêz kir û kembera pişta wî vekir. Wuha got:

-Ev bejn û bala te ya zirav, van çav û birûyên lihevhatî li ser te hene, ne heyfa te ku tu xwe di şere xenzîran de, bi rim û tîran dibetilînî û serê xwe diêşînî?

Destê xwe li hewa hejand, tavilê sê qîz perda deriyê kon hilanîn. Piyê Bijen bi miskê şûştin. Paşê her du bi hev re çûn bin çadira xwarinê. Şerab û rûd her li wur bû, dengê çengê jî dihat. Binê çadirê bûbû baskê Teyra Tawus, gêta rengan bû. Menîce di sitekanek bilûr de şerabek kevnare ji Bijen re anî.

Di kêf û zewq û şahiyâ de, sê şev û sê rojan mest bûn. Bijen bi wê serxweşiyâ bi balkâş hûr hûr lê nihêrî. Menîce her diçû bêtir xweşik dibû.

Menîce xemla xwe dikir,

Çavê xwe kil dikir,

Dest hine, bisk şe dikir.

Menîce çawa can e,

Gul e, sosin e, reyhan e,

Sîng fireh e û zozan e,

Memik gilover e bacan e.

Gerden tenik e şûşe ye,

Lêv sore wek lale ye,

Diran spî ye mercan e,

Gotin durr e, ziman şekir e,

Ênî dûz e weke meydan e.

Tesîra şerabê hila, hişê Bijen hat sera, li xwe nihêrî, serçavê xwe şûşt û bona vegerê destûr ji Menîce xwest. Lê belê Menîce hêja jê têr nebûbû. Nedixwest li wê çolê tenê bimîne. Rabû û baz da pişt kon, li wur bidizîka ji qewraşa xwe re got "Şerabekî ji mêvan re bibe, lê belê piçek dermanê bêhişiyê jî têke navê."

Menîce hat, vêcarê di himêza Bijen de rûnişt û pê şa bû. Kêlîkê bi şûn de jî bang li qew^ê kir:

^erabê ji me re bîne, ev bo Bijen sitekana dawî ye, ew'ê êdî vegere welatê xwe.

Şerab li ser tepsîyek zîv hat, her du "noş" kirin dîsa bi "hêviya dîtina carek din." Bijen di cîh de ket, sitûyê wî xeliya. Menîce lezand û deve anî ber derê kon û ew li ser devê hişk girêda. Rûyê Bijen jî bi temeziyê girt û bi hev re berê xwe dan paytexta Tûranê.

Menîce ew şev xwe gihand mal, di tarîbana şevê de Bijenê bêhiş bir oda xwe û ew li ser nivînan dirêj kir. Nivînek xweş, rûhevrîşim. Nîvê şevê dermanê şîyarkirinê anî û da ber pozê wî. Bijen bênijî û çavê xwe vekir di nava mitêlek xweş û li himêza keçek xweşik û spehî de xwe dît. Li dora xwe nihêrî, li wêneyan û paşê jî li rûyê Menîce meyzand, fam kir ku wê ew aniye koşka bavê xwe. Ew gav tirsek hêdîka di dilê wî de libitî. Pêşî libitî, dû re jî çiqas çû zêde bû. Ava sar bi çokên wî ve hat xwarê. “Ya Xwedanê şev û rojan! Êdî xelasiya min ji vir nîn e. Tu alîkariya min bike. Ax Gurgîn ax! Te min xapand! Te malik li min xera kir, agir bi konê bavê min ve danî!”

Menîce ji hezkiriyê xwe re got:

-Fikaran neke, xem nîn e.

Bijen serî hejand û ket milê wê, her du berê xwe dan oda xwarinê. Bijen di çavê wê de him dawet û şahî didît û him jî dara sêpê û xwîn. Menîce dilê wî dixwend:

-Ger bavê min bibihîze ku tu li cem min î, dîsa xem nîn e, ez dê xwe bikim biqurban ji te re, nahêlim ew xerabiyê bi te bike.

Sitekanên meyê ji destê wan hîç neket û dengê rûdê jî ji ber guhên wan neçû. Bi şev û roj leyistin û bi hev re raketin.

Rojek ji rojan dergevanê qesrê bala xwe da pencerên oda Menîce, nihêrî ku çira wê vêketiye. (Berê jî çend caran nîvê şevê vêketî dîtibû.) Bi dizîka, hêdî hêdî, mîna ku pêlî hêkan bike meşiya ber şibakT û li hundur nihêrî, dît ku xortekî biyanî wa ye

di himêza qîza paşd de ye. Nesekinî, berê xwe da meqamê Padişah û ev yek jê re got. Wuha jî bi ser ve kir: “Ew xort naşibe Tirkan, ser û sincên wî, çav û birûyên wî yên Iranîyan in.”

Efrasîyab lerizî. Belê, di mala xwe de tirsiya, kêfa wî nehat. Mîna terhika biyê li piya reilî. Rondikên çavê xwe paqij kir û di ber xwe de wuha got "Çima gotine mala qîzê mala belayê ye? Pêşiyan tiştekî ji paşiyan re nehiştiye."

Navê nazirê wî Qerexan bû, bang li wî kir:

-Qerexan! Tu xan î û pir yeman î,

Çeleng î, canfîda û xwey ramanî,

Ka bêje;

Ez çi bikim bi vê qahpika dera hanê?

Qerexan bersiv da:

-Ka lêpirsîn bike, rast e an virr e,

Hîn bike; hela tiştek wuha heye, an tune.

Efrasîyab vêcarê nûçe şand ji Gersîyûz re. Gelî guhdar û xwendevanan! Hûn Gersîyûz nas dikin û rola wî ya di kuştina Sîyavûş de jî tê bîra we. Ew peyayê xezebê û fesadiyê bû. Lewma Efrasîyab gazî wî kir. Ew şand oda Menîce û li wî wuha şîret kir:

-Suwariyan jî bi xwe re bibe, çi dibe, çi nabe? Pêşî di derî û pacan de, heke nebû di kulekê de li hundur binihêrin. Ger mêr li oda qîza min hebe, kî dibe bila bibe, bi zeqema sitûyê wî bigrin û bînin cem min.

Gersîyûz li çi digeriya? Rojên wuha jê re dawet bûn. Çû, derî şikest û ket hundurê oda Menîce. Ji hundur dengê rûd û çengê dihat, lewma kesek li dengê derî nehesand. Hire hira ken bi ser dengên din; yên muzîkê û şingîna sitekanan diket. Sê sed cariye li wur civiyabûn. Hin ji wan sitran digotin, hin ji wan

dîlan digirtin, hin jî li rûdê dixistin an şerab belav dikirin. Gersîyûz ket nava komiza elaleta wan û gahv bi gahv xwe nêzîkî Menîce kir. Çend peya jî li dû wî bûn. Hema destê xwe ji nişka ve li şeraba wê xist û rijand, got "Hey qaltax! Tu bi vî Iraniyê nêyar re çi dikî?" û derhal li ser Bijen zîvirî û ew tirsand: "Tu êdî di destê min de dîl î. Xelasî ji te re nîn e." Bijen bi tevdîr bû, wexta ku li Iranê bû jî herdem di saqa gîzma xwe de xencerek vedişart. Du gahv ji paş ve çû û dest avêt gîzmê, xencer ji kewdan kişand û halan di xwe da:

-Hûn zanin ez kî me lo? We hêja derba mêran li ber çavê xwe nedîtiye! Ji min re dibêjin Bijen, kurê Gîwê Guhderz im û xwarziyê Ristemê Zal im. Qiyamet jî rabe ez ji şer narevim. Ger tu cengê dixwazî, ez amade me. Lê ger tu dê min bibî cem Efrasîyab, ez'ê sebebê hatina xwe û vê rewşê ji te re bêjim.

Navê Ristem hemiyan şaş kir. Di cîh de sekinîn, muzîk cemidî, meyger li piya man û qadeh jî nîvco li ser masan. Gersîyûz li Bijen nihêrî, fam kir ku ew xwey biryar e. Çavek avêt xencera destê wî. Xwest bi şelafiyan pêşî ew bi xapîne û xencerê jê bistîne, dû re dîsa weke xwe bike.

-Ez sond dixwum bi sonda temam, destê kesekê bi te nabe. Em nizanin rastî çi ye. Ka hela wê xencerê ewul bide min, bila bela çê nebe, xwîn nerije. Her tişt bi axaftinê çê dibe. Ez'ê niha te bibim dîwana Padîşah, ew çi bêje ferman ya wî ye.

Bi vê gotina Gersîyûz, Bijen xencer dirêjî wî kir. Piştî destvala ma, pêlewanên li pişt Gersîyûz xwe avêtin ser wî û tavilê dest û piyên wî hişk girêdan ew anîn dîwana Padîşah.

Efrasîyab jê pirsî:

-Xwarzê ka bêje, tu tolaz î, an kewaşe yî, tu çi yî? Çi karê te li oda qîza min heye lawo? Bêje, tu çima ji Iranê hatî vir? Ya na tu sîxurê Xusrev î?

Bijen:

-Ez bi xwesteka dilê xwe nehatime vir. Qîza te ez bâhiş xistim û wê min anî qesrê. Ez bona li welatê Ermanê xenzîran bikujim ji Iranê derketim rê, lê mixabin min rê şaş kir, ez li mêrgekî rast hatim. Ew gav min başokek girtibû, mîratê ji destê min firiya, ez li pey wê çûm, hetanî rawestiyam. Li bin darekê nivîyam, perîyek, an pîrebokek hat, min di xew de hilanî û bi baskê xwe himêz kir, bi hewa xist, bir li bin konê qîza te danî. Rojek dudo li wur mam, wan derman dan min û ez bêhiş li ser devê girêdam. Min çavê xwe li navenda qesrê li oda Menîce vekir. Hal û mesele ev. Ne sûcê min heye, ne jî yê Menîce. Perî an cin, ew kî be, li min wuha kir, mala min xera kir.

Efrasîyab li axaftina wî nihêrî, li destên wî yê lerzok nihêrî û di çavê wî de nîşana derewiyê dît, pê bawer nekir.

-Xwarzê tu mîna serxweşan beletewş diaxifî. Çi cin û perî ne lawo, tu min dixapînî qaşo? Tu bi van virran nikarî canê xwe xelas bikî!

Bijen tevgera xwe guhert:

-Tu dibînî ku dest û piyên min girêdayî ne. Ger tu dijminiyê bi min re dikî, divê hoy û mercên me weke hev bin. Mêrxasî bi şerê yeke yek tê famkirin. Hespekî û gurzekî bide min, besî min e. Dixwazî hezar pêlewanên Tirk li dijî min derxe meydanê.

Efrasîyab bi vê galgalê hêrs bû, li pêlewanê xezebê zîvirî, çav jê re şikand û wuha got:

-Ya Gersîyûz!

Vî deyyûzî serî li ber min radike,

Canê xwe li kelemê rast dike,

Zû bike ji min re kendir bîne,

Dara sêpê li ber derî biedlîne.

Dest û piyê vî tolazî girêde,

Menîce jî li hember wî deyne,

Wî bi kendirê ve daleqîne,

Bila êdî çavê min wî nebîne.

Bijen ji huzura Padîşah deranîn. Ew gav dilê wî bi halê wî şewutî û kûrîn pê ket, giriya. Di dilê xwe de lorand û wuha naliya:

“Dilo lê wa yê, lê wa yê....

Ez êdî namînim li dewrana vê dunyayê,

Ez li ber kuştina xwe nakevim,

Wê bavê min bêje Bijen kuştin,

Dil û cegerê min helandin, sotin,

Rûmet û şeref ji me re nema ye.

Heyfa navê min, xortaniya min,

Heyfa bavê min, Ristemê xalê min.

Bayê bakur min baş bibihîze,

Here Iranê bike wîze wîze,

Bêje, hey gidî serok û rêberan,

Wa ye Bijen dikujin,

Gurgînê xayîn li meydanê dileyize.

Dilo lê wa yê, lê wa yê.

Bijen nemîne li darê vê dunyayê,

Mêrxasî îroj ji şelaf û xayinan re maye

Konê Guhderz şewutî, çira wî tefiya ye...

Wê demê wezîrê Efrasîyab yê milê çepê, Gersîyûz bû, lê belê wezîrê milê rastê Pîran bû. Gersîyûz kuştina Bijen pir dixwest. Wextê kurê Gîw di zîndanê de bû, rojekê xwe gihand dîwana Padîşah, got “Em çima wî bi dara sêpê ve, bona Iranî êbretê jê bigrin, wî danaleqînin? Bila gelê me jî bibîne ku kesê çav berde qîza paşê çi tê serê wî.”

Em Bijen li zîndanê bihêlin, werin ser Menîce. Gava dilketiyê wê girtin, seba ku wê Gersîyûz nas dikir, zanî bû ku xelasiya Bijen nîn e. Lewma ew şev lez kir, kincên mêran temîn kir, kumê zabîtekî da serê xwe û bi vî awayî ji qesrê derket der. Nîvê şevê li deriyê Pîran xist. Bavê wê gotina Pîran li erdê nadixist û ew nadişikand. Çi bûbû, çi nebûbû ji serî hetanî binî ji Pîran re got û rast axifî, baweriya Pîran bi xwe anî. Bû sibeh, Pîran ket rê û raste rast berê xwe da dîwanxana Padîşah. Lê belê li ber derê qesrê dara sêpê bala wî kişand. Kemendek jî pê ve hilawistî bû. Bang li dergevanan kir:

-Ev çi dara sêpê ye? Padîşah ji kî hêrs bûye û çima ecz bûye dîsa?

Dergevanan serî pêl kir, lê Gersîyûz ji hundur derket bersiv da:

-Dijminê me kî ne? Ev jî yek ji wan e. Navê wî Bijen e, bila têr janê bikşîne! Ji Iranê heta vir li ecelê xwe geriyaye! Kurê kerê hatiye tolaziyê. Çavê xwe berra qîza paşê daye. Min ew di hundur de, di paşila Menîce de zeft kir. Lê derewan dike, li gor min ew hatiye antaxiyê, sîxurê Xusro ye ew.

Pîran lê guhdarî kir û paşê wuha got:

-Ka ew li ku derê ye niha?

Dergevanan bersiv dan:

-Di zîndanê de ye!

Pîran nesekinî, dev ji çûndina cem Efrasîyab berda, berê xwe da zîndanê. Derî bi dergevan da vekirin. Nihêrî ku xortekî lihevhatî, dest û piyên wî girêdayî ne, wa ye di wî cîhê tarî de, li quncik dinale û bi xwe re diaxife. Serê wî jî berjêr e û wusa melûl melûl xwe bi ser çokan de tewandiye. Dilê Pîran bi halê wî şewutî, çend histêr ji çavên wî dawerivîn ser simbêlan. Bijen jî zûr mabû, bi tirs li wî dinihêrî. Ji wî tirê ku hatiye wî bibe daleqîne. Pîran got:

-Xwarzê çi karê te li vir heye, moriyê diya te li vir qetiyane lawo? Tu hatiyî nava Tirkan bo çi?

Bijen vêcarê rast axifî, her tiştî jê re got.

-Ez bi Gurgînê hevalê xwe xapiyam, wî min anî nava konên keçikên Tûranî... Menîce derman da min, ez bêhiş xistim û min anî vir.

Pîran nihêrî ku îfada Menîce û ya Bijen li hev dertên û her du jî rast in.

-Sebr bike û miraq meke. Ez'ê te ji vir xelas bikim, got jê

re.

Pîran bi derencika Zîndanê ve hilkişiya û lezand cem Efrasîyab, destê xwe li hember wî da ser hev, bejna xwe jî tewand. Wesf û peznê wî da û li ber textê wî ji piya rawestiya. Efrasîyab bi karekî din ewle dibû, kêlîkê bi şûn de li wî hay bû.

-Ka bêje tu çi dixwazî? Nirxa te li cem min heye, tu çi dibêjî bêje, tu serbest î. Zîv û zêr dixwazî, an serfermandariya afî^ê? Bi xweziya dest nagihîje baqê keziya. Bêje, bila gotin di dilê te de nemîne.

Pîran hêdî hêdî lêv libitand:

-Paşayâ min, bila tac û kursîyê te ebedî be. Hemî serokên dunê peznê te didin, dibêjin kesek xwe li ber Iraniyan nagre ji xeynî Efrasîyab. Ez ji xwe re tiştekî naxwazim, jixwe niha çi di dest min de heye, bi saya te ye. Ne ji

te be, ez tune me. Lê belê derdekî min heye, ez'ê bêjim. Tu Padîşahekî xwey tevdîr û bi eql û îzan î, pêşî û paşiya xwe jî dizanî. Te niha Bijenê Iranî hêsîr girtiye û avêtiye bin zîndanê û dara sêpê jî wa ye li ber derî ye. Çima? Bi xeniqandina wî, gelo wê çi têkeve destê me Tûraniyan? Ka bêje? Guneh e, rebeno bêdilê xwe hatiye. Ew xapandine û anîne vir. Ka bifikire, hêja xwîna Sîyavûş zuwa nebûye, tu xwe dixî nava alava agirekî din. Ger tu Bijen bikujî, wê dijminiya nava me û Iraniyan dîsa germ bibe. Wê birîn nuh bibin. Sal nuh û şere me û wan nuh! Nayê bîra te, ez li dijî kuştina Sîyavûş bûm, min ew gav gotibû Sîyavûş ji malbata Keyaniyan e û ji te hez dike, lewma bûye zavê te. Te guh neda min. Te dît piştre çawa bû; wan jî serê kurê te jêkir û dû re Ristemê Zal êri^ kir kuç li ser kuç nehişt, heft salan welatê me di bin hukmê wî de naliya. Niha jî Zalê Zêrîn hêja şûr nexistiye kewdan. Ger Ristem keys li me bîne, ji bona tola Sîyavûş av bi ser me de venaxwe. Ger em Bijen jî bikujin, wê Iranî agir bi ser me ve bibarînin. Ew çax toz û dûmana neyariyê wê li ser her dû welatan mijê çê bike. Xwîn bi xwînê nayê şûştin mîrê min! Tu jî Gîw nas dikî, ew'ê heyfa kurê xwe li erdê bihêle? Na. Lê Ristem? Ma hewce ye ez bêjim? Lê niha riya rast...

Ev gotin di devê wî de, Gersîyûz ket hundur, li şêmûka derî sekinî û got:

-Li ber derî dar û ben Me pêk anî bo Bijen,

Ruhê wî derxin ji can,

Bila pêlewanê me Pîran,

288

Li me neke derewan,

Ew dijminê me Iran,

Me dixapînin b’galgalan,

Ya padîşah, mîrê mîran!

Ew neyarin ji bav û kalan.

Pîran ew bê bersiv nehişt, lê wuha vegerand:

-Ya Gersîyûzê navmilpan!

Dîsa digerînî dek û dolaban,

Ev dîwana bi nirx û giran,

Heta niha lê rûniştine,

Gelek kurê dê û bavan.

Padîşah ji Pîran re got:

-Bijenê Gîw, ew lawukê Iranî,

Binêre çi bi min de anî!

Ma qey tu pê nizanî?

Wî qîza min îxfal kir,

Rûreşiyê bi me de anî.

Pîran got:

-Mîrê min! Gotina te jî rast e. Em nav û rûmeta te nadin bi cîhanê. Lê ez jî naxwazim Bijen were azatkirin. Riya eql û dadê çi ye, ew ji me re divê. A baş ev e, em wî nexeniqînin, wî bavêjin binê zîndanê, bila hetanî sax be dîl bimîne di wur de û birize. Heta ew di destê me de hêsîr be, Iranî jî nikarin êri^ bînin ser me. Ew êdî mertal e ji me re mîrê min!

Efrasîyab:

-Te îcar rast got. Dîlgirtin ji kuştinâ çêtir e.

Piştre bang kir:

-Gersîyûz! Gersîyûz! Hey deyyûz! Rabe, zûka dest û piyê wî şeytanî girêde, pişta wî bi baxê Rûmê bişidîne û wî bavêje binê bîrê. Bi zincîran wî serserkî daleqîne, bila ne tavê bibîne û ne jî rûyê heyvê. Demek berê min zinarekî mezin ji bin deryayê deranî bû û ew avêtibû nava daristanê. Navê wî zinarî Kevirê Dêwê Eqwan e. Biçe, wî kevirî jî bîne û deyne ser devê bîrê. Tu jî li wur nobedar be.

Gersîyûz enîya xwe qermiçand, lê belê xemgîniya xwe veşart:

-Ser serê min, mîrê min! Lê cezayê Menîce çi ye? Te ew ji bîr kir.

-Wê togê serqol û pêxwas bikin, kirasekî kitan lê bikin di kolanan de bigerînin bila der û cîran ew bibînin. Bila ev sosreta giran pozê wê bişewutîne da careke din gûkî wuha nexwe.

Gersîyûz deriyê dîwana paşê li dû xwe girt, Bijen ji zîndanê deranî, bi erdê re kaş kir, anî ber bîrê, dest û piyên wî ji ben vekir, lê vêcarê bi zincîran girêda, baxê Rûmê li pişta wî xist. Piştre çû Kevirê Dêwê Eqwan ji nava daristanê anî, Bijen bi kevir ve girê da û serserkî berra bîrê da. Dû re, berê xwe da qonaxa Menîce. Bi alîkariya leşkeren qesrê qîza paşê zeft kir, gencîna wê talan kir, kincên wê zîval zîvalî kir, seranpê tazî û pêxwas ew anî ser bîrê. Jê re got:

-Binihêre li evîndarê xwe. Êdî cîhê te jî li vir e. Bermaliya dilketiyê xwe bike! Bila Bijenê te bêqew^ nemîne. Her roj li hev binihêrin, her roj bi hev re bin!

Gersîyûz, Menîce li wur hişt û vegeriya. Keçika reben li wê çolê bi tena serê xwe ma û bi ser halê xwe de giriya û naliya; axê bi serê xwe de kir, pora serê xwe kaş kir. Rûçikê xwe bi

290

neynokan peritand. Kêlîkê bi şûn de bang li Bijen kir, lê belê dengê wê neçû dîlê bin bîrê. Sê şev û sê rojan bêhiş geriya û dîsa zîvirî ser devê bîrê, bi neynokên xwe yên tûj qulek di ser devê bîrê de vekir, di wê qulê de bi Bijen re axifî, avê li dilê xwe û wî kir. Piştre berê xwe da nava bajêr. Kolan bi kolan, derî bi derî geriya, geştê kir û parsê kir:

"Gelî Tûraniyan, gelî der û cîranan,

Keça Efrasîyab, ez xuşka we ya ji can,

Serê min girêdane bi paç û desmalan,

Rûyê min şil e, ez bi kirasê kitanan,

Ez serqol û pêxwas kirime,

Min berdane nav sûk û kolanan,

Bona xatirê Bijenê Gîwê Guhderz,

Xortê Iranî, xwarziyê Ristemê Zal,

Min kirine parsek û pîr û kal,

Ez di bextê we de me, hûn ji mal Gezekî nanê tisî bidin min,

Ez'ê bona xwe û Bijen bibim."

Menîce bi vî awayî, ji serê sibehê hetanî êvarê parsê dikir. Nan û xwarina ku dicivand tixist tûrikê xwe dibir, di wê qula ser bîrê de ji Bijen re davêt û bi ser de jî digiriya û dilorand.

Gelo Gurgîn di çi halî de bû?

Gurgînê Mîlad, piştî ku rêça Bijen wunda kir, bi şev û roj lê geriya lê belê ew nedît, bo wî giriya û li çokên xwe xist. Lê poşmanî feyde nedida. Li nava wê daristanê li cîhê konê Menîce çû û hat, vir de û wê de, ne dengek dihat û ne kesek serî bilind dikir. Lê belê ji dûr ve hîrîna hespekî bihîst,

hêvî ket dila, ber bi deng bazda. Şevreng li wê çolê dît, gem û dizgîna wî qetiya bû,

zînê wî ketibû bin zik. Ew gav bawer kir ku tiştekî xerab hatiye serê suwarê Şevreng. Ew girt cem xwe û berê xwe da îranê. Bi rê ve di kûraniya poşmaniyê de li xwe mukur hat. Çend roj bi şûn de xwe gihand îranê, lê belê li wur nesekinî, menzîla wî heta Zabilê bû. Derbasî Zabilistanê bû û çû cem mala Gîw, diya Bijen, xuşka Ristemê Zal li mal dît. Jê re qala wundabûna hevalê xwe kir. Diya Bijen hewarek li dar xist û kirasê xwe qetand, gijik bi xwe re nehişt. Dengê giriyê wê li çil çiyayan belav bû. Şivan û gavan jî zare zara wê bihîstin. Marîn û borîn ji pez û dewaran çû. Ew gav, Ristemê Zal ji xewa heft şev û heft rojan şiyar bû.

Ristem ne dişibî tu mirovî,

Binihêrin li wî Qelafetfîlî:

Tiliyên wî mîna xiyaran,

Zend û bendên wî wek qurmên çinaran Damarên çavê wî sor dibûn,

Herwekî qurmên spîndaran,

Serê xwe rakir, pirsî ji dergevanan:

“Xêr e, ev çi tofan e, çi bûye?

Kî tadeyî li gelê Zabilê kiriye?”

Xuşka wî, diya Bijen bersiv da:

“Wey lo! Wey lo! Wey lo!

Sermezinê kapgoliko...

Hêstirdizê, bi şîre hêstiran mezinbûyî!

Çawa xewa te tê, li nava zerî û esmeran?

Rabe, ger tu mêrê baş bî ji mêran,

Bijenê xwarziyê te dîl e li nav Turan!”

Ristem di dilê xwe de wuha got: “Bi Xwedê Bijen dîsa bi pey qîz û jinan ketiye. Ez xuyê wî dizanim. Roja ku em çûbûn şere Ab û Neynokdirêj tê ji bîr kirin? Talîya talî xuşka wan ji xwe re anî, lê belê ew jin du sal li cem wî nema, ew berda û şand mala bavê wê.”

Gîw, bihîst ku Gurgîn ji Ermanê vegeriyaye malê, lê kurê wî li wur maye, li hespê xwe suwar bû û berê xwe da cem Gurgîn bona hîn bike da çi bi serê wan de hatiye. Gurgîn li ber derî bû, ji dûr ve dît ku wa ye Gîw di rê de ye, lê mîna ecacê tê, tozê bi ser xwe xistiye. Bazda hundur, kumê xwe danî, xwe serqot kir û gîzme ji piyê xwe deranî, bi vî awayî bi leq wî de çû. Wadê her du nêzî hev bûn, qêrîn bi Gîw ket:

-Ya pêlewanê bijarte! Te çima xwe serqot û pêxwas kiriye, va ye ez dihatim mala te.

Gurgîn:

-Ez bi derd û kul im, her roj dinalim, ji fediyê serê min li ber te ranabe. Ez çiqasî rondikên xwînî birêjim, heqqê min e. Lê belê dilê xwe fireh bike, bawer dikim ku Bijen hêja sax e.

Şevreng li ber derî tewulandî bû, Gîw ew dît, hiş ji sera çû. Ji ser zîn gindirî xwarê û di nava tozê de gevizî. Kincê xwe yên pehlewî qetand, pertal pertalî kir. Berê xwe da ezmana:

-Ya Xwedayê şev û rojan! Piştî ku kurê min çû, hema ruhê min jî bistîne çêtir e. ew hevalbend û hogirê min bû. Niha ez xwe di devê ejderha de dihesênim.

Ew bavê çav bi xwîn, li ser Gurgîn zîvirî:

-Ka bêje, çi hat serê we?

Gurgîn ji wê rewşa Gîw, ji dilê biêş û peritî tirsiya, li riya virrê geriya:

-Daristanek li Ermanê hebû, tê de xenzîr pêlî hev û din dikirin, xilbe bûn mîratan! Hemî bi hev re êrî^î me kirin. Me jî li wan xist, gelek ji wan kuşt, serê wan jî jêkir. Ger tu bawer nakî wa serê wan li mal in. Piştî ku karê me xelas bû, me got em'ê li vir çi bikin, me berê xwe da Iranê, lê li rê, di geliyekî xalî de askek ji nişka ve derket pêşiya me. Pirça wê mîna pirça hespê Guhderz Gulgûn bû, serê wê dişibiya serê hespê Ferhad û bi guh û dûva xwe jî weke Şevreng bû. Xweşik bû kambaxê û îcar tê bêjî dibeziya! Teyra Sîmir jî ne wusa bû li bezê! Gava Bijen ew dît, xwe negirt û ji cîh hilqevizî. Da dû askê, ha li vî alî û ha li wî alî kemend avêt serê wê, lê belê aska xweşik teqizî û reviya, bêtir teriqî. Bijen hespê li dû ajot, hetanî her du di nava dûmanê de ji ber çavê min wunda bûn. Ez bi şev û roj lê geriyam, lê eyb e eyb, tu li ku Bijen li ku! Qet pêjna wî nedihat. Demek bi şûn de jî ez bi hîrîna Şevreng veciniqîm. Zîn avêtibû bin zikê xwe, di rewşeke nexweş de bû.

Gîw bi Gurgîn bawer nekir. Gava diaxifî, rengê rûyê wî û awurên çavê wî diguherîn. Madê wî zer dibû mîna temeziyê. Fam kir ku ew derewan dike. Bi wî dilê şikestî û birîndar xwe negirt:

-Hey virrekê pîs û heram! Te heyv û roja min tarî kir, kurê min da kuştin! Ez'ê te niha bibim cem Şah, bila ew di derheqa te de biryar bide û te ceza bike.

Gîw bi milê Gurgîn girt û ew anî paytexta Iranî dîwanxana Keyxusrayê Mubarek. "Ya Padîşahê Cîhanê!" got, "rewşa lawê min Bijen xerab e û hevalê wî Gurgîn jî di derheqa wî de rast naaxife. Cezayê wî çi ye tu bidêkê."

Keyxusrev bi dilekî xweş bersiva wî da:

-Gîwê Guhderz! Qet metirse, nekeve xem û xetereyan, remldaran reml avêtiye, dîtine ku Bijen hêja li jiyanê ye. Hêviya

294

xwe jê nebirre. Ger pêwîst be, ez'ê ji bona Bijen berê ad^ê bidim tuxubê Tûranê. Em'ê him tola Sîyavûş ji wan bistênin û him jî Bijen bi xwe re bînin. Hîç miraq meke û serê xwe meêşîne.

Şah li ser Gurgîn zîvirî. Gurgîn di bin tîrêja nêrîna wî de pelçiqî û serê xwe xist ber xwe, erdê maç kir, peznê wî da, çend diranên xenzîran ji berîka xwe deranî û li ber wî danî. Hêdî axifî:

-Bila padîşahê me hertim serfiraz be û her roja wî Newroz

be!

Padîşah pirsî:

-Ka Bijen? Me tu mîna rêber pê re şand, te ew li ku hişt? An te ew li cîhekî kuşt?

Devê Gurgîn qefilî, zimanê wî werimî û di devê wî de mîna goştekî zêde û jêkirî sar bû. Di nava diranan de çend bêje mirmirand, bû pil pila wî, lê ji wî nehat fam kirin. Dest bi lerzê kir, li piya reilî, talerzê girt nava wî mîna mirovê ku tetirxanî bibe. Got daristan, çayir, kerên kûvî, ask, nizanim çi... Keyxusrev hêrs bû û ew ji dîwana xwe qewurand. Bang li hesinkêrê qesrê kir, got "Ji hesinê bibizmar kostekek çê bike û li piyê vî zilamî bixe."

Roj derbas dibûn, hefte û meh jî li dû. Buhar xemilî û roja Newrozê hat bi ser wan de. Di wê roja pîroz de, Keyxusrayê Mubarek qedeha xwe ya bisêhr û ya remla danî ber xwe û bang li Gîw kir, ew jî anî dîwana xwe. Kincên ji qumaşê Rûmî li xwe kir û li odeyek tenha bi ser "sitekana pîroz" de dua kir û giriya. Ji Xwedanê şev û rojan qewet xwest. Piştre çû taca

Keyanî da serê xwe li nava sitekanê nihêrî, tê de heft welat dît. Di dîrokê de çi bûye û wê di pêşerojê de çi bibe hat ber çavê wî. Roj û heyv, stêrka Zuhal (Saturn), Bercîs (Jûpîter) û Gelawêj, paşê jî

Hurmuz dît. Lê belê Bijen nedixuya. Fam kir ku ew di zîndanê de dîl e. Tavilê serê xwe rakir û bang li katibê xwe kir, got “lez bike, nameyekê ji Ristem re binivîsîne, bila nesekine were.”

Em wan li wur bihêlin, werin ser diya Bijen, xwuşka Ristemê Zal. Malûm e, dilê dayikan zîz e û êşa wan kûr e. Ew bi kesera lawê xwe ji Zabilê derket, çol û pesar da ber xwe, ne got ev çiya ye, ne got ev gelî ye, giriya, hewar û gazî kir, mîna ku dîn bibe û bi çolê keve, bi şev û roj nesekinî, bi rê ve çû. Ne xew ket çavê wê, ne tiştek xwar û ne jî rawesta, heta xwe gihand welatê Tûranê. Çiyayek li wur hebû, jê re digotin Çiyayê Şader^, çû wur li nava da’l û daristanan geriya. Sal di ser re buhurî, lê belê li şop û nîşana kurê xwe rast nehat. Rojek ji rojan leqay karwanekî bû, ji bajarê Estexrê dihat. Çû pêşiya karwan, li çokên xwe xist û dîsa giriya, got “Kurê min wunda ye” û mşa^n wî bi lêv kir, pirsî “Gelo hûn lê rast nehatine?”

Xortekî çardeh-panzdeh salî ji nava karwan derket:

-Yadê tu ji ku derê yî?

-Ez ji alî Iranê me yadê bi qurban. Qey tu li Bijen rast hatî, ka bêje ew li ku ye?

- Na dayê ez li parsekek rast hatim li sûka bajarekî. Ew jinikek belengaz bû. Gepa nan lê hisret bû. Wuha lave lav dikir:

“Ez Menîce me, keça Efrasîyabê Bavpêşeng im,

Serê min girêdane bi desmalan,

Laşê min şil e ji kirasê kitanan,

Wan ez serqot û pêxwas kirim,

Di kolan û sûkan de xwar kirin,

Ez ciwan bûm, lê niha bûm pîr û kal,

Bo Bijenê Gîw, xwarziyê Ristemê Zal!”

Wuha kilam digot û parsê dikir. Dû re destê xwe vedikir “Ez di bextê te de me, bextê Xwedayê Şev û rojan! Gepek nan bide min, Bijenê min di zîndanê de birçî ye!” Min jê pirsî “Bijen kî ye û tu kî yî?” Parseka rûçilmisî, porqirêj û kincqetiyayî got “Ez dilketiya Bijen im, bavê min li me hat xezebê, evîndarê min xiste bîrê û ez jî kirim pêxwas û parsek. Her roj ji Bijen re nan û xwarinê pars dikim, jê re dibim, di qula ser bîrê re davêjim hundur, ew têr dikim.” Dema ew wuha diaxifîn, zilamek hat cem me û bi milê min girt, min daf da got “Lawo here li riya xwe, guh mede vê parseka dînik! Xwe têkilî vê şoK meke, tu rêwî yî, here li riya xwe.” Niha ez dizanim ku ew jina parsek li kîjan kolanan digere, lê dayê ez ditirsim ji te re bêjim.

Diya Bijen bi rûyê sor û lêvên lerzok bi ser de çû:

-Yellah, zûka bêje! Ger ez destê xwe bi te bikim, ez dê bi lingên te bigrim, te li ser milê çepê bavêjim li binê ta’tê bixînim ku heft şev û heft rojan kesek nikaribe goştê canê te ji wur berevke.

Xortê nuhatî ku hêja simbêlên wî xwêdan dida tirsiya.

Got:

-Ez dê te bibim wî bajarî, lê divê karwan min azad berde.

Karwan bi rê ket û çû, ew man li wur. Diya Bijen ew xort bi xwe re anî Zabilistanê. Kêliya ket hundurê Qela Zabilê bi sewteke tûj û bi dengekî bilind lîland. Bi dengê wê re Ristemê Zal ji xewa heft şev û heft rojan şiyar bû. Serê xwe ji şibaka qesrê deranî got:

-We xêr e? Kî tadeyî li gelê Zabilê kiriye? Kîja qîz an jin e dike tilîlî?

Xuşka wî bersiv da:

-Wey lo, wey lo, wey lo! Pê sitûrê navmilaşvano! Çawa xewa te tê bi zerî û esmeran? Ger tu mêrekî baş î, rabe ser xwe, roj roja mêran e, Bijenê me wa ye li bajarê Tûran e, di destê Efrasîyabê mezinê Tirkan de ye.

Ristem got:

-Xuşka min a delal! Min hêja salek berê di derheqa Bijen de name ji Keyxusrayê Mübarek girtibû. Haya min ji Bijen û rewşa wî heye. Ez cîhê wî jî dizanim. Divê em xwe ji cengê re amade bikin.

Ristemê Zalê, serbilindê welatê Nîvrojê Kar û bara xwe kir,

Bang li bajarvanî û hemwelatiyan kir,

Leşkere giran,

Bi çek û qantir û fîlan,

Bi defa hewarê,

U zengilê Hindê Hemîkesî rakir ser piya,

Qîre qîr û hinge hing derket,

Hêwurze kete bajar û çiya,

Elaletek civiya,

Ji dengê wan qesr û qonax hejiyan,

Ji bircan deng vejiyan,

Heta ev deng ket kerrika guhê Zalê Zêrîn.

Destan rabû piya,

Rahişt gopal û meşiya.

Sê car got:

-Hey lo, hey lo, hey lo! Ev çi hingîniye ketiye bajarê Zabilê?

Pîremêrek devê xwe bir ber guhê wî:

-Ristemê te îroj ferman daye, leşkere giran bi rê dikeve, wê herin qesra Keyxusrayê Mubarek.

Zalê Kal:

-Ji Ristemo re bêjin bila bêyî xebera min neçe. Min jî bigihînin cem Keyxusro, çend şu^n min jê re hene.

Heft sertaş anîn, serê Zalê Zêrîn qusandin bi heft meqes û heft hevringan. Paşê texterewanekî anîn heftê fîl û gergedan pê ve girêdan. Ew bi rê ketin berê xwe dan paytexta Iranê.

Ew birin ber derê dîwanxanê. Gava Zal çû hundur, silav li kesên dîwanxanê kir. Hemî ji ber wî rabûn piya, xwedî eşîr û xwedî sermiyan. Keyxusrayê Mubarek ji miqamê xwe rabû û ber bi wî ve hat, destê wî maç kir û ew bir li ser textê xwe da rûniştîn.

Jê re wuha got:

-Tu bavê me yî! Ferman bide ka tu çi dibêjî? Ka çi şîret û nesîhetên te hene?

Destanê kal:

-Wa weylê, wa weylê! Xwelî li serê min be, nesîhetên bavan çima zûka ji bîra lawan diçin? Elaletek mezin ji leşkeran bicivînin. Bila Ristem ji nava wan sê sed pêlewan bibijêre, bila du sed pêlewanan bike hundurê du sed sindoqan, bila ewan li ser pişta fîl û gergedanan girê bide û sed ji wan jî bike qantirçî. Dema çû Tûranê, bila bêje ez xwedî karwan in ji Yemenê têm.

Ristem ji nava afî^ê suwariyên gir, bi dest û pê û jêhatî bijart, rabû kincekî ji qumaşên Rûmê ku bazirganan li xwe dikir ji bejna xwe re çêkir, kember

li ser girêda û li Rexş suwar bû. Gurzê Sam bi zîn ve kir, derket meydanê. Ew gav guhê Rexşê Belek gihîşt nava ewran û serê Tuhemdem hetanî ber rojê bilind bû! Gazî Feramûz kir, got “Lawo tu li vir be, rêveberiya Zabilê bike, va ye ez diçim, dibe ku çûndin hebe, veger tunebe.”

Feramûz pêlewanekî bi nav û deng bû, kurê Ristem yê ku ji xuşka Gîw bû. Damara mêrxasan tê de hebû. Ristem û Gîw, tevî sed hezar suwariyên bijarte berê xwe dan Iranê. Kêliya gihîştin hafa qesra Keyxusrev, bayekî honik li rûyê wan xist, mîna ku silava ezmanan ji wan re anî. Gîw li pêş beziya, çû xebera hatina Ristem da Padîşah:

-Mîrê min! Karê me êdî di rê de ye. Ristem xwey biryar e, dudilî nîn e, fermana te bêşik bin cîh tîne. Wa ye tê.

Keyxusrev keniya, bang li Guhderz û Tûs û Ferhad kir, got nesekinin, herin pêşiya wî, bi pîrozî xêrhatin lê bidin. Pêlewan rabûn, bi leq Ristem ve çûn. Dîsa ba li damûskan xist, dîsa hîrîn bi caniyan ket û al hilkişiyan jor cardin.

Ristem li ber derê qesrê rawesta, peznê Xusrev da: -Hurmuz çawa Behrem parast, hêvî dikim bila te jî wusa têxe bin baskê xwe. Erdbuhuşt(Cennetmekan), Hêjîr û Behramê Hêç jî hertim bila parezvanên te bin. Felek jî bila qewraşa te be ya Şehînşahê Mezin!

Şah lê vegerand:

-Tu bu xêr û xweşî hatî! Destê xeraban bila ji te dûr be! Tu serokê hemî padîşahên dunê yî. Parêzvanê Iranê tu yî.

Ferman da, deriyê baxçe vebû, tac û textê zêrîn anîn, li bin darên gulan danîn. Dareke xwedestî (sunî) derxistin derve, bejna darê ji zîv bû û guliyên wê ji aqûd û zêr. Pelên wê ji akîk û fêkiyên wê ji zebercet bûn. Nava wan fêkiyan qewartî bûn bi şerab û miskê dagirtî bûn. Kesê ku li ser kursîyê Şah rûdinişt, li bêhna wê derê dimijiya, lewma piştre ew bêhn ji wî jî dihat.

Şehînşah hat li ser text danişî û meyger hemî hatin li hember wî rêz girtin. Şah ji Ristem re wuha got:

-Te mîna Teyra Sîmir baskê xwe li ser ezmanê Iranê vegirtiye. Li dijî hemî belayan tu me mîna mertalekî diparêzî. Li

300

dunê, ji bilî êşa ewlad, tiştekî bi axîn û keserkûr nîn e. Çareyek bibîne da em Bijen xelas kin û dilê Gîw derman bikin. Hesp, çek, dirav, zêr... Tu çi dixwazî, ji te re amade ye.

Ristem:

-Hemî serokên dunê axa bin piyê te ne! Tu nekeve xem û xetereyan, li kêfa xwe binihêre. Ez im yê ku bi gurzê giran dil û cegera dêwên Mazenderanê parçe parçe kir. Min ne leşker divê, ne jî çek. Ez tenê bes im.

Gurgîn agahdarî girtibû ku bona xelaskirina Bijen wê Ristem biçe Tûranê, lewma name şandibû û gotibû "Ez jî dixwazim bi te re werim. Dibe ku bi vî awayî ez xwe bi Keyxusrev bidim efâkirin." Ristem bi vê nameyê hêrs bûbû û bersivek tûj jê re lê kiribû: "Mirovê bêoxir û dilreş! Tu û cengê dûrî hev in. Ziravê kewroşkê bi te ve heye. Ez te bi xwe re nabim. Lê belê bona efûkirina te, ez'ê bi Keyxusrev re biaxifim. Ger em Bijen azad bikin û bînin, jixwe tu dê jî serbest bibî, lê ger xwarziyê min hatibe kuştin, qet siûda te jî wê tunebe! Ji niha ve xwe mirî bihesibîne!"

Ristem ew roj mesela Gurgîn ji Şah re got. Keyxusrev ew neşikand û kurê Mîlad ji oda tarî deranî.

Keyxusrev, Ristemê Zal vexwendî dîwanxanê kir û li wur jê pirsî:

-Ji cengê re çi divê?Amadehî lazim e. Çek û hesp, pêlewan û erzax. Lez bike, ez ditirsim ku Efrasîyab li serguzeştiyê digere, heta hûn bigihîjin wur, wê serê Bijen jê bike.

Ristem:

-Padîşahê min, ez tiştekî naxwazim, min berê jî gotibû. Mifta bûyerên wuha hîle û dek û dolab in. Bavê min Zalê Zêrîn şîret li min kiriye, ez dê gotina wî bin cîh bînim, fen û fît li Tûraniyan çêkim ez'ê. Bi kincên bazirganan ez dê herim, bi dizî

têkevim hundur, bila min nas nekin. Lê belê pêdiviya min bi karwan jî heye.

Bi xebera Zalê Zêrîn kirin, ji nava art^ê sê sed pêlewan bijartin, du sed ji wan kirin hundurê du sed sindoqan, li pişta du sed fîl û gergedanan kirin, sed jî kirin qantirçî û seyis. Kine û qumaş, mueevherat û xalîçe li ser pişta hesp û fîlan bin eîh kirin, heqîb û çewalan dagirtin. Gustehem û Gurgîn (Ristem biryara xwe guhert ew bi xwe re bir), Zenge û Guraze, Ferhad û Eşkes jî xwe amade kirin, ew bûn seyisê hespan.

Karwan derket rê. Gava gihîştin nêzîkî tuxubê Iranê, Ristem bi milên serokên pêlewanan girt û wuha şîret li wan kir:

-Şîyar bin, hetanî ez nekevim tengasiyê, bila kesek şûr nekşîne û ji eîh nelive.

Leşkeren ku li pey wan çûbûn, li vî aliyê tuxub man, "Karwan" berê xwe da Tûranistanê. Ristemê Zal kembera zêrîn ji pişta xwe vekiribû û abayê bazirganan li xwe kiribû. Hevalên wî jî kineên keten li xwe kiribûn û mîna seyîs û qantirçiyan xwe girêdabûn.

Li wî welatî rê û rêçik pirsîn, pêşî berê xwe dan bajarê ku Pîran lê dijî. Kuçe kuçe geriyan, mala Pîran ji yekî pirsîn. Çûn ber deriyê wî. Lê nihêrîn ku xwediyê malê ne li mal e. Dergevan û xizmetkaran ew li ber derî

sekinandin. Demekê li wur ewle bûn, hetanî Pîran zîvirî malê. Ristem ebayek bi ser serê xwe de vegirt û sitekanek tijî mueevher kir, girt destê xwe û du hespên zînzêrîn jî da pêşiya xwe. Bang li qantirçî û seyisan kir: “Bimeşin seraya Pîran!” Ew li pêş û yên din li dû ketin hundur. Ristem bang kir:

-Ya qehremanê li Iran û Tûranê menşûr! Tu wezîrê Padîşah û xemla paytexta Tûranê yî.

Pîran bi vê sewtê re şaş ma:

-Tu kî yî? Ji ku derê tê yî û diçî ku?

Bazirgan:

-Ez qûlê te, axa bin piyê te me, bazirganim. Ji Yemenê têm û diçim berjor. Malên paqij, zîv û zêr û xalîçên hevrîşimî bi min re hene. Xwedê rizqê min li welatê we daye. Niha ez ji Iranê têm. Ez him difroşim, him dikirim. Ger tu destûra min bidî, ez dê li bajarê te etariya xwe raxim, bila nanê zarokan derkeve. Tika dikim alîkar be, bila belayek neyê serê min.

Sitekana destê xwe vala kir ber Pîran, zêr li erdê biriqîn, hefsarê her du hespan jî da destê dergevanên wî. Pîran gava çav bi zêran ket, çav li sera birbisîn û beloqî bûn. Got “Bazirgano were, li kêleka kursiyê min rûnê. Tu çawa dixwazî wusa eşyayên xwe bifroşe, tu serbest î. Li nava bajêr jî bigerîne. Kesek nikare pêçiya xwe bi te bike. Dilê te çi hilanî, tu dikarî bikirî jî. Ji te re dukan pêwîst be, deriyê mala kurê min jî li ber te vekirî ye.

Bazirgan knxweş bû, got:

-Ya wezîrê Efrasîyabê Pîroz! Ez nikarim li mala kurê te razêm. Malê gazê û eşyayên din gelek in, ger ez ne li ber bim, wê bên dizîn. Lewma dukanek vala bide min çêtir e.

Pîran, bona xatirê bazirgan û hevalên wî xaniyek vala kir û wan di wur de bineîh kir.

Dotira rojê nûçeyek li ser zimanan belav bû: “Bazirganek hatiye ji Yemenê, bûye mêvanê Pîran, barê karwan mueevher in, xalîçe û qumaşên xweş in.”

Ji çar aliyên Tûranê gel eiviyan ser serê Bazirgan. Ji berbanga sibehê, hetanî tarîbana şevê Iraniyan bazirganî kirin, eşya firotin û kirîn. Menîee jî ji nava bajêr gava li geştê bû bihîst ku Bazirganek hatiye Tûranê û li bajarê Pîran e, çerçîtîyê dikin.

Menîce hat, serqot û pêxwas, bi kincên qetiyayî û pînekirî. Bi dawa lîbasê xwe yê qirêj û qetiyayî histêrên çavê xwe paqij kir û ji Bazirgan re got:

-Lo lo Mîro! Wusa xuya ye ku tu ji mal û xanan û ji jiyanê têr bûyî. Ez di çavê te de dibînim ku tu ji malbatek xuyanî yî! heviya min ev e ku felek hertim bi te re bikene û nezera çavan li te nekeve. Hêviyên te vala derneyên û keda te bi avê ve neçe. Bila eql rêberê te be. Ka ji xuşka xwe re bêje tu ji ku tê yî mêvanê ezîz, bazirganê dilzîz?

Bazirgan:

-Ez ji Yemenê me. Berî niha li Iranê bûm, ez ji wur têm.

Menîce:

-Gelo Şahê Iranê Keya çawa ye, Gîw û Guhderz çi dikin, ew jî sax û selamet in? We xeberek ji Bijenê kurê Gîw hilanî an na? Te jî bihîstiye ku Bijen girtine, dest û piyê wî li qeydê xistine? Ne heyfa wî! Bi Xwedê ez gelekî pê diêşim. Bi şev û roj xew nakeve çavê min!

Ristem bi van gotinên jinika parsek ku ji nişka ve her tiştî eşkere digot şaş ma û dev ji bazirganiyê berda. Bala xwe li ser wê civand. Hinekî jî ponijî û xays çû. Bi tevdîr û ba^ş bû, lewma got:

-De derkeve ji cem min parseka qereçîya beradayî! Ez ne Xusrevê te nas dikim ne jî Bijen! Tu kî yî û ew kî ne? Tu dîn î an bacîlok î? Bicehime here ji vir!

Bi hêrsek hişk û zeliqokî barîya bi ser parsekê de ku xwîna jinika belengaz cemidî û dilê wê sekinî. Lê belê neçû, di cîh de mat ma, li rûyê Ristem nihêrî. Hema bi carekê re zûrîn pê ket û giriya. Giriya û hey giriya. Hetanî ji çavên wê rondikên xwînî niqutîn û herikîn.

-Tu bazirganekî zîrek î. Çêr û galgalên pîs bi te nakeve. Jixwe ez birîndar im, birîna min pir xedar e. Tu jî xwê li vê birînê meke. Tu ne mecbûrî bersiva min bidî, lê belê min ji cem xwe neqewurîne.

Menîce wuha got û dest bi sitranekê kir ku gelekî bi şewat

bû:

“Lo lo Bazirgano, çepildirêjo, navmilpano!

Şevgêrê şevê, zîreko û nijdevano!

Ji dilê xwe zengîn û mêrxas, lê niha dergevano!

Tu qet ji Xwedê natirsî,

Li halê Menîce û Bijen napirsî,

Em her roj dixwun nanê tisî,

Xwarina kufikî, ava qerisî,

Weke Efrasîyabê bavê min,

Ger zalim û zorker bî tu jî,

Ne bazirganî, ne rêwî yî, lê mêrkujî Ez hetanî sax bim li darê dunê,

Ji bîr nakim van galgalan û çêrên te jî,

Ez Xatûna Qesrê me, Menîca rûpaqijî,

Min navê tasek girara te ya pîs û rijî.”

Dîsa giriya, îske îska wê mûyê canê Ristem gij kir:

-Jinika pîrebok! Çi bûye ji te keçê? Te qiyamet rakir. Tu nahêlî ez eşyayên xwe bifroşim, nan ji zarokên xwe re bibim. Lewma ez bi te re hêrs bûm. De rabe ji cem min biçe, karê min heye. Gel civiyaye li ber derî. Ez Iraniyan û pêlewanên wan nas nakim. Tu çima li wan dipirsî?

Menîce:

-Bijen niha di bin bîrê de dinale, ez jî her roj parsê dikim û jê re nan û av dibim di qula ser bîrê re davêjim hundur. Hêviya min ew bû ku tu nûçeyek, mizgîniyek ji bavê wî Gîw û ji xalê wî Ristemê Zal bînî jê re. Lê belê tu min diqewurînî. Ez keça Efrasîyab im, li qesr û qonaxên mala bavê xwe mezin bûm. Canê min tavê nedîtibû. Lê niha, sedemî Bijen ez seranpê tazî û xwas im, rondikên xwînî li sûk û kolanan dirêjim. Parsê dikim û li gezek nanê ceh hewce me. Bona evîna dil, ne taca serê min ma û ne jî textê bin min. Lo lo Bazirgano, ez bi heyrano, ger riya te cardin bi Iranê ket, xwe bigihîne Guhderzîyê Geşvat an jî Gîwê qehreman. Ger ew jî nebe, biçe Zabilê mala Zalê Zêrîn, xwe bigihîne Ristemê Qelafetfîl suwarê Rexşê Belek, bêje Ristemo ka tu pêlewanê meydana cengê bûyî? Ka gurz û şûre te li ku ma? Malneketo xwarziyê te di bin bîrê de birîndar e, kurm ketine canê wî û dinale, ger hûn dereng bimînin wê here ji ruh û cane.

Ristem di dilê xwe de giriya, rondikên xwe bi hundurê xwe de niqutand. Got:

-Megrî megrî, keça rûxweşik megrî! Girî pere nake. Wextê xwe li vir nebuhurîne û rondikan nebarîne, here cem mezin û porspî û ekabîran, derdê xwe ji wan re bêje, bila herin xwe bavêjin lingên bavê te, ji wî hêvî û rica bikin, dibe ku ew nerm bikin, bi vî awayî rehmê têxin dilê wî. Ez rebenê Xwedê bazirgan im, ji bavê te ditirsim.

Ristem di cîh de zîvirî çav ji nanpêj û xizmetkarên xwe re şikand, yek ji wan hat. Ristem di guhê wî de got "Zûka miri^kekê serjê bikin û bipijînin, têxin nava nan û ji min re bînin. Em dê bidin vê parsekê bila ji dilketiyê xwe re bibe."

Mirîşk pijandin û anîn, Ristem çû pişt dezgehê û gustîla destê xwe deranî û xist nava goştê miri^kê. Vegeriya û ji jina parsek re got:

-Ev nan û goşt bona Bijen e. Bibe ji wî re, bila birçî nemîne. Ger tu bixwazî, cardin were. Ez dê xwarinê ji te re amade bikim.

Menîce rahişt nan û miri^kê, bi bazdan derket der. Ew şev xwe gihand ser bîrê, di qulê de goşt û nan da evîndarê xwe.

Bijen çav bi goştê nava nên ket, ecêbmayî bû, heta wê gavê Menîce goşt jê re neanî bû. Got:

-Ya dîlbera min a piyarî,

Ez îcar zanim tu yar î,

Ka bêje, te ev xwarin ji ku anî?

Menîce:

-Piyarîbûn ji dilê min'ê şewutî tê. Ez li ser te dîn bûm û bi çolan ketim. Bazirganekî zengîn ji Yemenê hatiye, lê riya wî bi Iranê jî ketiye. Mirovekî zîrek e, ji her teherî kinc û mucevher aniye. Pîran cîh û war daye wî,

bazirganiyê dike. Min jê re qala te kir, wî jî ev nan û goşt da min. Got heke tu bixwazî, dîsa were.

Bijen nava nên vekir, li goştê biraştî nihêrî. Him tirsiya ku bijehrî be û him jî hêvî di dila de pijkuvî. Bêriya goşt kiribû, gepek du gep werimand û cût. Hesinek ket nava diranên wî, luqma cûtîkirî rijand cenga xwe, gustîl biriqî ew gav. Gustîla zêr da ber ronahiya qulikê, navê Ristemê Zal li ser nivîsî bû. Şaş ma; carek din da ber çavê xwe û baş lê nihêrî, tîpên hûr û zirav li ber çavên wî leylan dan. Hêvî geş bû, bawerî bi xelasiyê anî. Her tengasiyek firehî li dû xwe dianî. Hema xwe negirt ji kêfa keniya. Bi kenekî xeniqok ket ku hire hira wî çû guhê

Menîce. Keça Efrasîyab xwe bi ser bîrê ve daqulî kir, wuha fikirî: “Bijen di bîrê de dîn bûye. Hiş û eql ji sera çûye.”

-Çi bû ji te, di wê bîra tarî de bo çi wuha dikenî?

Bijen:

-Taliha min çirûskek ronahî şanî min da, ez lewma dikenim dîlbera min. Lê belê ez vê sirra xwe ji te re jî nabêjim. Bawerî bi jinan nayê, gotin di devê wan de nasekine, Lê belê ger tu sond bixwî ku tu dê ji kesekî re nebêjî, ez dê giliyê xwe ji te re bêjim.

Menîce li çokên xwe xist:

-Wa wey lê, wa wey lê! Min jiyana xwe li bin piyê te raxist. Min dil da te û taca zêrîn jî kir bi qurban. Tu hêja bi min bawer nakî? Te ez kirim parsek, lê tu nepeniyên xwe ji min vedişêrî?

Bijen poşman bû:

-Tu rast dibêjî. Lê belê, niha guhê xwe bi ba^ş bide min; ew Bazirgan ji Iranê heta vir hatiye bona min ji vir xelas bike. Ew ne Bazirgan e! Te fam kir? Rê li pêş me vebû, ez lewma ji kêfa dikenim. Tu dê jî xelas bibî ji vê

cefayê. Rabe, hîç nesekine û dîsa biçe cem wî Bazirganî. Bi dizîka jê re bêje “Ya Bazirganê Xwedanxêr! Ger tu Ristemê Zal î, navê xwe ji min veneşêre.”

Menîce di nava dar û devî û daristanan re meşiya û cardin hat ber derê Bazirgan. Silava Bijen lê kir û wê pirsê jê kir. Bazirgan li rewşa wê nihêrî baş wê lêkolîn kir û guh dayê. Fam kir ku Bijen navê wî eşkere kiriye. Wuha bi tinaz û dek axifî:

-Hurmuz bila te ji hezkirina Bijen mehrûm neke, te jî gelek cefa kişandiye. Rabe û qet nesekine, biçe ser bîrê, ji Bijen re bêje Xwedayê Şev û rojan suwarê Rexşê Belek, bavê Feramûz ji te re şandiye. Lê tu hay ji xwe hebe, bila kesek bi vê

yekê nehise! Gava tarî ket erdê, li benda dengekî bimîne. Li nava wê daristanê, li nêzîkî wê bîrê agir vêxe.

Menîce bi kêf û coş bû, zîtik avêt û bazda. Hat ser qalpaxa bîrê, xebera xêrê ji Bijen re anî û wuha bi ser ve kir:

-Ez îşev nobedar im û gava dunya tarî bibe, ez dê li vir agir vêxim bona Ristem cîhê me kufş bike.

Evîna dilê Bijen xurt bû:

-Jina min a canfîda! Te hewqas derd û kul kişand, dev ji dê û bav, xuşk û bira, tac û text berda. Ger ez ji zîndanê bifilitim, mîna marekî ziya ji bin erdê derkevim, weke mirovekî ku xwe li ber peristgehê xûz bike, ez’ê li ber te xwe xwar bikim, destê xwe vekim. Mîna dergevanên ber derê Qela Zabilê ez’ê ji te re xizmet bikim û di şekala piyê te de avê vexwum.

Menîce, mîna çivîka ku ji ser çîqilekî darê bifire ser yekî din, vir de û wê de çindik da xwe û êzingan ji nava daristanê civand. Çavekî wê li şaxên

hişk û puş, çavê din li rojê bû. Gava roj çû ava, çiya û bergeh wunda bûn, agir bi êzingan ve danî û dora bîrê ronî kir. Kêlîkê bi şûn de jî dengê nalên hespan hat.

Du leşkeren Efrasîyab li ser devê bîrê raçaviyê dikirin. Gava çav bi Ristem ketin, ew nas kirin, gotin:

-Ya heciyê Yemenî!

Nêzîk nebe ez benî!

Ristem got:

-Ez kher im, we nabihîzim...

Nobedaran:

-Mafir ku tu kher î, tu çawa dikarî bersiva me bidî?

Ristem:

-Na xêr! Ez nabihîzim, got û gahv bi gahv xwe nêzîkî wan

kir.

Nobedaran:

-Xwe nêz meke. Ev cara sêemîn e ku em te hişdarî dikin, em dê tîr bavêjin te.

Ristem dîsa meşiya û xwe gihand cem wan, serê her du nobedaran li hev xist, mêjiyê wan pijiqand ser terrafa êgir. Zîvirî ser heft pêlewanan got “Ji hespan dakevin, dema vekirina bîrê hat. Qalpaxa bîrê, Kevirê Eqwan e. Rakin wî kevirî û bavêjin nava daristanê.” Di dilê xwe de jî wuha got “Ez ji Eqwan xelas bûm, lê vêcarê kevirê wî derket pêşiya min!” Berî ku Heft pêlewan bi hev re rakin kevir, Bijen dengê Ristem bihîst û zincîra xwe ji kevir vekir. Lê eyb e eyb! Kevir ne kevir bû mîrato, risasê dojehê bû, ji cîh nedilibitî. Di nava xwîn û xwêdanê de man, lê nafîle! Ristem fermana xwe dubare kir: “Lawo hûn bêtaqet in, qewet di milê we de nema ye, an zikê

we birçî ye, derman ji çokên we firiyaye?” Pêlewanan careke din ceribandin, lê nebû, kevir ji cîh neleqiya. Ristem hema ji Rexş xwe çengî erdê kir, zerxê xwe qenc şidand û dest avêt kevir, bi carekê re ew bilind kir û heliqand nava daristanê. Ji gurmîna wî kevirî erd hejiya, qirçîn ji daran çû. Meşiya ser devê bîrê û xwe bi ser Bijen de xwar kir:

-Cîhê te xweş e lo? Tu mêhvanan nahewînî?

Bijen:

-Gava min dengê te bihîst, hemî jahrîyên dunê guherîn hunguv. Tu dibînî, ev bîr bûye mala min. Erd av û ezman kevir!

Ristem jê sozek xwest:

-Hes û xwesteka tolhildanê ji dilê xwe bavêje. Gurgîn bi me re hat bona te xelas bike. Tika dikim wî efû bike, tiştê çû nede dû.

Bijen bi rik û xerez bû:

-Xalo, ma tu nizanî wî bêbavî çi anî serê min! Kêliya ez ji vir derkevim, ez’ê felekan jê re çêkim.

Ristem xwey bîr û bawerî bû:

-Na xwarzê, wuha nabe! Ger tu li pey heyfê bigerî, ez’ê te li vir bihêlim û vegerim Iranê.

Bijen:

-Ez çiqas bêsiûd im! ^tê ku hatiye serê min ne bes e, vêca divê ez bi wî xayinî re li hev jî werim? Ev ne tu edalet e! Lê belê tu xalê min î, min ew da xatirê te.

Ristem şûtika pişta xwe vekir, şûtika wî ji werîsê pêlewanan dirêjtir bû, berra bîrê da. Bijen serê şûtikê zeft kir û li pişta xwe pêça, pihêt girêda. Xal, xwarziyê xwe ji bîrê kişand der. Bedena Bijen îppelatazî û piyên wî

hêja girêdayî bûn. Gelekî lawaz ketibû û por û neynokên wî dirêj bûbûn. Zincîrên zengarî di canê wî de birîn vekiribûn. Rûyê wî weke temeziyê bû, Spîka çavê wî jî wusa. Ristem zincîr û qeydan bi destê xwe qetand, kosteka piyê wî vekir.

Ristemê Zal, Menîce û Bijen li hespan suwar kir û bi xwe re anî, ew li mala bazirganiyê bincîh kir. Her du evîndar serê xwe şûştin, Bijen destek kincên wezîriyê li xwe kir û Menîce jî yê xatûnan bi bejna xwe de berda. Her du li wur ketin kêf û seyranê, bi hesreta dilê xwe şa bûn.

Dengê Ristem ji derve dihat, digot "Sindoqan bişkênin!"

Du sed sindoq şikestin, du sed xweşmêr ji wan derketin û rabûn piya. Tevî qantirçî û seyisan sê sed pêlewan li dora kurê Zalê civiyan. Gurgîn jî di nav wan de cîh girt, lê belê Ristem ew cihê kir û got "Tu here cîhê bazirganiyê, xwe bi Bijen û Menîce bide efûkirin."

Gurgîn wusa kir, çû cem her du hezkiriyan û serî li ber wan tewand, axê bi xwede kir û giriya. Piştî ku ew li hev hatin,

dîsa vegeriya cem Ristem û nava elaletê. Eşkes nobedar bû li ber eşyayan û malê karwaniyê û mucevheran.

Ristem bang kir:

-Hey ho! Hey ho! Zûka Rexşr Belek zîn bikin û bixemilînin. Bîna şer, bîna xwêdan û xwînê ket pozê min!

Heft qalib sabûna Helebê li ser pişta Rexş helandin, zînê entabî li piştê şidandin, gufkên Ruhayî pê de berdan, xurca Xoresanî li ser danîn, lixaba xulxulî ya Yemenê xistin devê wî. Ristem rabû, zirîç û kumzirîçê xwe hilanî, kurk û ebayên Herranî jî li ser kir, kedikê Tîranî avêt pişta xwe, mertala ji mifriq û pola li ber xwe danî, dîsa gurzê Sam qatilê gelek jîndaran da ser milê xwe, sê caran bi destê rastê gurz avêt û bi destê çepê ew li hewa girt. Halan di xwe da:

-Ez Ristemê Zal im, ez'ê qirra Tûraniyan bînim. Ez'ê tenê kesên ji diya xwe nebûyî bihêlim li ser vê axê.

Şev bû, du sed û not û neh pêlewanan bi ser qesra Efrasîyab ve girtin. Ristem destê xwe avêt deriyê qesrê û qeflê şikest, bizmaran jê deranî û ajote hundur. Li wur jî qêrîn jê çû: -Rabe Efrasîyab rabe! Ez dê xewa şêrîn li te heram bikim! Te gava li ser text kêfê dikir, Bijenê reben di kêferat û kefteleftê de bû. Rabe ser xwe, Ristemê Zabilî hat. Min Kevirê Dêwê Eqwan ji ser bîrê avêt û Bijen azad kir. Roja tolhildanê ye keftarê pîr! Min hêja Sîyavûş ji bîr nekiriye.

Efrasîyab dengê Ristem yê qube û sewta wî ya tûj nas dikir. Ji nava ciya rabû û bang li notirvan û dergevanan kir. Dengê qêrîn û hewarê ket qesrê.

Reniyên reşî rabûn, xewa mirinê ketibû çavan,

Melayketan piyên xwe kişandin ji ezmanan Teyra Sîmir firiya ser pozê çiyayê Elburzê,

Hût û nehingên bahrê gewdê xwe ji avê hilkişandin,

Pîr û oldaran gotin 'rabin roja qiyametê ye,'

Hin ji wan gotin 'Na xêr! Qiyamet nîn e,

Iranî û Tûranî ne,

Ew bi nav hev ketine wa ye gurmîn e!'

Ne mij e, ne moran e,

Ne berf e, ne baran e,

Ne toz e, ne dûman e,

Cenga Iranî û Tûraniyan e,

Li aliyekî hîre hîra hespan e,

Li alî din xweş tê dengê halanên kurê bavan e,

Ne qiyamet e, ne jî axirê zeman e.

Ji artışa Tûranê, kesên ku berê xwe dan qesrê, hemî li ber derî ji alî pêlewanên Iranî ve hatin kuştin. Efrasîyab dev ji kursî û dîwana xwe berda û reviya. Cariyeyên wî bi leheng û pêlewanên Iranî re keniyan û bi destê wan girtin. Kurtanê hespê Tûraniyan ji dara narewanê bû, postên pilingan li ser zik û pişta wan vegirtî bûn. Gencîneya Efrasîyab, malê gazê û xalîçê hevrîşimî xistin wan sindoqên ku pêlewanên bijarte di wan de veşartî bûn.

Iraniyan destê xwe sivik girtin, bi lez û bez qesrê wêran kirin, bona vegerê ketin rê ew şev. Dotira rojê, dema tav li pozê çiyê xist û zer kir, suwariyên Tûranî li ber derê qesrê civiyan. Mîna ku erdhejek li wur ketibe, her tişt ser û binê hev bûbû. Hemiyan kember girê dabûn û li pêş derê Efrasîyabê Bavpêşeng sef girtin. Di nava wan de, zana û porspî hebûn, pêşî ew axifîn: “Em jî nizanin bêjin çi! Ev têkçûyîn, heta roja qiyametê weke daxê wê li ser eniya me bimîne. Êdî ji Iraniyan, wê kesek me ji zilaman nehesibîne...”

Ji alî din ve, bûyerên ku li Tûranê çêbûbûn, azadkirina Bijen, serkeftina pêlewanên Iranî hemî ji Keyxusrayê Mubarek re hatibûn gotin. Şah bihîst ku xêbeta wî ketiye rê û ber bi welêt ve tê, ji kêfa rabû piya û destê xwe vekir, dua kir, dû re rûyê xwe di xalîçê da. Rondikên şahiyê ji çavên wî bariyan.

Def û borî lêketin, lê ev car ne ji bona şer, bona vegera Ristemê Zal û hevalên wî. Suwarî li ber derê qesra şah civiyan, ji girseya hespan ax nedixuya. Bajar hemî di bin dengê defên tûncîn de dilerizî. Hîrîna hespan dihat û ji alî din ve fîlên hêç bi diranên tûj li erdê cot dikirin. Ala ad^ê li pey Guhderz û Tûs dihat. Li ser zimanê hemîkesî navê Ristemê Zal hebû.

Leşker deste deste bi pêş diketin. Gava serê hespê Tuhemdem xuya kir, Gîw ji hespa xwe daket û piyatî meşiya.

Gotina pêşî ya Guhderz û Gîw bû:

-Ya pêlewanê bi şan û şeref! Bila Xwedanê şev û rojan û Hurmuzê Pîroz te bistrînin! Tu her bijî! Heyv û roj herdem bila li ber serê te çerx bibin. Hemî gelên dunê ji dîtina rûyê te, tucar têr nebin! Me, bi saya te kurê xwe Bijen dît. Hemî stêrik bên cem hev, nikarin mîna rojê tîrêjan belav bikin. Sozekî pêşiyan heye: Şêrekî ji garanek kerê kûvî natirse. Tu di nava Tûraniyan de şêr î. Piştî ku başok basik vekir, karê kewê dibe rev. Bêyî kedê, tiştek bi dest nakeve. Kalên me wuha gotine ku, heta dilê mirov neke qiçe qiç, dîzika mirov nake piçe piç.

Keyxusrayê Mubarek derket ber deriyê qesrê, lewma hemî pêlewanan serê xwe li ba xistin û lê nihêrîn. Hemî deng hatin birrîn. Tuhemdem ewul li pêş wî rawestiya û çok da erdê û xwe xwar kir, dû re jî çû ew himêz kir. Şahê Iranê bi dengekî êlî gotarek kurt anî zimên:

“Ristemê Zal,

Kurê Destanê Kal!

Ruhê comerdiyê, xawêniyê û qewîniyê! Qenciyên ku te kiriye, mîna tîrêjên rojê li hemî rûyê gerdûnê belav bûne... Jixwe mirovên ku rêveberiyê heq bike, pewîst e ku ji gelê xwe jêhatîtir û birûmetir be. Tu jî mînak î ji vê yekê re.”

Ristem hêdîka ji cîh libitî û di nava elaletê de, çû bi milê Bijen girt û ew anî ber bavê wî. Gîw ne Gîwê berê bû, ji keser û kedera kurê xwe melûl bûbû û pişta wî jî xûz bûbû. Keniya û histêrên şahiyê reşand. Pişta xwe rast kir.

Dîlên ku ji Tûranê bi xwe re anî bûn, li pişt wan di rêzê de bûn. Ristem çû nava refên wan û tevî zicîr û qeydan ew anîn û li hember Keyxusrev rêz kir. Şah li wan nihêrî û berê xwe da Ristem:

-Zal êdî pîr û kal e, piyekî wî li hafa gorê ye. Lê ez zanim ku ew'ê bi dilekî aram û serfiraz koç bike. Li pey xwe mêrxasekî mîna te dihêle. Hey gidî! Axa Zabilê çiqas pîroz e! Çawa yekî mîna te vejand? Hêvî û xwesteka min ev e ku, welatê Nîvrojê herdem bi navê te bextewar bibe.

Dû re li ser Gîw zîvirî:

-Ristemê Zal, lawê te xelas kir. Bijen hêja nuh ji diya xwe

çêbû!

Gora Ristemê Zal niha li Iranê ye û li gor gotinên gotinbêjan nêzîkî du mîtro û nîv dirêj e.

Ilon, 2000, Diyarbekir

Pirtûkên Edîb Polat yen çapkirî ev in:

-Rastiya Dîyarbekir-1988

-Berbangên Newrozê-1990

-Di Zimanê Zanistî de Kurd û Kurdistan-1992

-Sîketinên ji Welatê Bêdewêl-1992

-"Zinakar"-1998

-Evîna Mirinê Bêhezkirin e-1998 Xelatên wî:

-Xelata Azadiya Ramanê ya Human Rîght Watch (1994) -Xelata Amerîqan Pen ya Azadiya Nivisê-Barbara Goldsmîth (1994)
**

ROJEK JI ROJÊN EVDAILÊ

"ÊZEYNiKÊ ROMAN
Mehmed Uzun
Mehmed Uzun,
berhemên wi' yên çapbûyî;
Roman<ru 1,985
MIRINA KALEKI RIND 1987
SIYA EVINÊ 1989
'WC[ict:
ZIMl\NE ÇIYA
' arold Pinter 990
ROJEK JI ROJEN EVDATE ZEYNIKE
ROMAN
Mehmed Uzun
1
1
Stockholm 1991
VVeşan:7 "
ROJEK JI ROJÊN EVDALÊ ZEYNIKÊ Çapa Yekem
C" M"ehmed Uzun
Pergela berg Q rûpelan: Apec- Tryck Wêneyê berga pêşîn: Rebwar Said
ISBN: 91-971254 5~8
Xanî Ji kemalî bêkemali Meydana kernali dite xalî Hasflji înad eger Ji bêdad Ev btdhet e ger xiklft m(tad
Safl şemirand vexwar diTdi Manendi de'rî lis an t, kurdi
Înay'e nizam û înttzamê Keşaye ceJa)'! boyî amê
Da xelk nebêjitin ku ekrad
Bê me'rtjet in bê esl û binyad Enwa'i mUet xudan kitêb in Kunnanc bi tenê di bê hesêb in Hem e'hl'i nezer nebên ku Kurmanc
Eşq nekiJinJi, bo xwe amanc
Têk da ne di talib m, ne metlûb
Vêk ra ne mOtib bin, ew ne mehbûb Bêbehre' ne ew Ji eşqbazi
Farix Ji heqîqî, û mecazt

Kunnanc ne ptr di bê kemal in Em-ma di yetûn û bê mecal in Fflcfmle ne caha û nezan in
Belkî di seJil, û bê xudan in
EHMEDÊ XANÎ
Ji bo bîranîna Dr
Nureddîn 24za
U Dr (Jasim1û
GOTmAuiN
Navê min Ehmed e
Ehmedê Ferman
Ehmedê Fermanê Kîkî
Yani Ehmed navê min e
Ferman hem paşnav hem jî siûda min e
KMjî ji Kika
n tê, navê eşîra min e
Hin navên min ên din jî hene: dengbêjê kovarê
stranvanê Hawarê û hwd
Heta car1naji bo min weha jî tê gotin: "dengbêjê me yê delal, kalemêrê Kîkan, roniya çavan, ixtiyarê civatan, berdevkê maqûl û axan û berdtlê ciwan 11 xortan,
Gava meriv zarşêrtn be û bixwaZe dilê yeki xweş bike
gotin û qise pir m
Belê, rast e: ez dengbêj û stranvan im
Ji stran, kilam çîrok, mesele
serpêhatî û gotinan pê ve
ez bi kêrî tu tiştî nayêm Gotin Jîna min e
Gava ez hatim dinê û bi tiştan hesiyam, tiştê yekemîn car bi ber guhê min ket, lorîna diya min bû
Qewlê min ê mirinê jî weha ye; ege Yezdanê pak û dilovan mirineke pak nasibê min bike
ez dil dikim ku dengbêjekî dengxweş û xwedî adet û ûsU lt ber serê min rûne Q lorîna diya min bi min btguhezîne
Di vê jina xwe ya dirêj de, min her celeb kirêtî û xirabî dîtin

Her celeb tofan
nisûbeti ket pêsira
7
me kurdan û bû siya me
Mlrtn, kuştin, şewat, nalîn" qîrîn û hawar bûn nan û ava me, Welatê me bû xirbe Û
kavil
Xwedayo
~ niha ew çiya, zozan, deşt
şikeft, bajar û gundên welatê Kurdistanê bikaribûna bipeylviyana
û serpêhatiyên xwe bigotina! Hey lê gidî
wan çi dîttn, çi riedîttn!
Hema
meriv çavê xwe li van bûyerên 34 salên dawin bigerîne
ji
1900'î û vir ve, J'! nîv milyonî bêtir kurd hatin ku ştin 6 li welatê kurdan bû çar parçe
Şere malkambax ê cîhanê bi sed hezaran kurd bmn gorê
D:l
serîhildanên kurdan ên
1925i 1927-28
1930 a
n de ji
disan
bi deh hezaran kurd serê xwe danîn
Ba û 'bahozên mirinê bi ser welate kurdan de hat, Welatê kurdan
bû warê Ruhtstîn
Herçi Yezdanê mezin e, wî
ji rû ji kurdan bada
Û ez
Tevî kurdan fermana min jî rabû û ez ketim ber pêla xerîbiyê
Ferman, xerîbî û hesret bûn navê min, qedera mm,
Ez niha li vir

li w-elatê xerîbiyê
1 Şamê, rûniştîme û U hal û hewalê xwe difikirim
Hay 10
U min gidiyo hay
, Eger ev gotinên kurdî nebûna
min ê çi bikira? Ma eger Jina min bi stran, kilam, dîlan û gotinên
kurdî nehattba rtsandtn, ez ê nebûma din û neketima çolan?
Ew nan û
ava min In, heval û hogirên min in
yara
min in
Ew her tiştê min in
Ji wan pê ve tu kese min tune
Ew bûne stanya min
welatê min
Lê hûn werm ji min rebenê Xwedê btpirstn ka çi bi serê qise û gotina şêrin
a kurdî hatiye
Ew îro bûne qedexe
Iro li TIrkiyê kesên ku bi kurdî dipeyivin, tên cezakirin
Ceza gotineke kurdî qurişekî ye
Du gotin
du qurtş, sê gotin sê qurtş
Hey gidî dinya malkambax: heyl,
Lê li milê din ji kêfa min tê ku ez iro ne li Kurdistanê me
Ez bi tirkî nizanim û tûrikê min tijî gotinên kurdi ye
Min ê çawan hewqas ceza bida?
8
Mal Û milkên beg û mîran jî dê têra cezayên min nekira
~
Bi xêra Xwedê 'ku ez ne li wir' im
Belê
ez niha li Şamê me
Li taxa Muhactrtn, li, mala Mîr Celadet Bedirxan

Iro ji rojan yekşemb e
Meh nîsan e
sal 1934 e
Dinya germ e
Biharê dest pê kirlye
Min jî xwe daye beroşkê
Kursiyeke hûrik
jî li ber min e û ez di deftereke hûrik de van rêzan
dtnrvtstm
Ez rebenê Xwedê û ntvtsml
Hûn ê niha bipirsin ka Mîr Celadet Bedirxan ki
ye? Mîr Celadet heye û birayê wî yê biçûk Mîr Kamiran heye
Her du jî du mêrên qenc, zilamên xurt û têgihiştî
merivên pak û dilovai in
Ew ji mala Ezîzan, ji malbata mîrên Cizîra Botan in
Ew kurên Emîn Alî Begê Bedirxanî û neviyê mîrê dawîn ê Cizîra Botan, Mîr Bedirxan in
Herwekî bav û kalên
xwe, dilê wan ji bi m1letperwerî û welateviniya kurdî hildavê
'Wan dane ser şopa, bav 'û kalên xwe û ew li pey heq û hiqûqên kurdan in
Li milekî ew di nav tevgera siyasî de ne û 11 milekî ji ew bi kar û xebata ziman û edebiyata kurdî, rabûne, Ew ji bêgav mane û ketine welatê xertbtyê û, niha 11 Şamê dijîn,
Çima ez qala van merivên mêrxas û, yekta dikim? Ji ber ku siûda min û wan bûye yek
Em bûne şirîkê qederekê
Em bi hev re bûne malek, Ez bê wan nabim
Ew jî, carina" bê min
Ew bûne lawên min
Ew' bûne bavê min
'Ez 11 mala Celadet Beg dijîm
Ez û ew û xezaleke delal

çar kewên nbat û celab û du tahjiyên no û bt hezaran kitêbên wî, bi hev re
dijîn,
Pir caran stran" dtlan û çîrokên 'min
ji dibin hevalên me
U li gora qewlê mêrê qenc
heta mirinê, em ê li cem hev bine U ez 11 vê derê jî dibêjim; m 'ji Yezdanê dilovan tikayek ji heye
ne bi dû wan re, lê berê wan, ez serê xwe day1n1m diyarê rehmetê, axa gorê
9
Eger Xwedê quwet û taqetê bide min
ez ê rojekê behsa xwe û serpêhatiyên xwe jî bikim
Lê ne niha
Niha min bi hênceta Evda ê Zeynikê rahiştiye qelemê
Ez ê behsa Evdalê Zeynikê û çîroka wî bikim
Eger ji 'min 'were
Min dengbêjiya hin mtr, beg û paşayên kurdan kiriye
Dengê, stran
tembûr û bilûra min û gotina kurdî şevên wan dineqişandin
Stran û dîlanê reng dida qesr
qonax û koşkên wan
Digel meclîs û odên van qesr û koşkên bi mÎS û ember, min zêrzemînên wan jî dftme
Li wan deran zîndanên tarî hene
Xwedê merivan ji wan zindanên sar û gent star bike
lê belê
ez divê li xwe mikur jî wer:Jm; strana de altirîn û baştirîn a zîndanan et
Ew li ber dilê 'win pir ezîz in
Axir
~
ew dewr û dewran bihurîn
Şerê cîhanê mina, hûtekî bi ser serê me de hat û nefes 11 me çikand

'Paşê Jî pişta welatê kurdan hat şikandin Û dijminan ew kirin çai perçe
Çar perçên ku, h,er nexweş in, û êdî bi zehmetî sax dibin
Bi dû vê kirêtiyê Ji, dijminê kurdan navê kurd û Kurdtstanê
ji defteran derxistin û wela kirin wêran
Hingê min ê
evdalê Xwedê çi bikira? Ez 'ne şervanekî bûm ku min rahişta tifinga xwe û bik
aribfiya bi ser warên eskerê dijmin de bigirta, Ez ne alîm 11 zanayeki bûm
ku rahtştima qelema xwe û dinê bi hal û hewalê kurdan bihesanda
Ez ne mîr, beg
axa û şêx bûm ku min xelk, 11 dora xwe b
icivanda û bi karê
siyasî rabûma
Ez dengbêjekî reben bûm
Ma ji destê dengbêjekî pênçperan çi tê? J
i btlûr û stranên
min pe ve, tu
tiştekî m tune bû, Min ew hildan û pişta, xwe da feleka kambax û berê xwe da oxirê
Ez çûm gundên asê ku xwe li quntar 1l kendalên asê veşartibûn
Min li wir reşa xwe girêda û xwe spart stranan
Stran bûn lehî
Ew' bûn berfende Stranên
10
kevn stranên nû 'welidandin
Her bûyer û her şehîd bû qehremanê straneke nû
Dengê bilûrê û stranan di spêda rojan û serê çiyan de olan didan,
Rojekê ciwanmêrekî gir û bi qelafet hat gundê ku ez lê dimam Ew li pey min bû
wi şopa min hildabû û hatibû gund û ji min dixwest ku ez pê re herim
Ew Ji riya dûr hatibû, ji Şamê
Wî weha digot,
- Stran û çîrokên kurdî heyîn û dewlemendiya

me ya heri mezin e
Heyam diguherin
Heke em lê xwedî dernekevtn, ew ê winda bibin, ew divê bikevin defteran
Belê 'wî dixwest 'ku em b hev re
berê xwe bidin Şamê
herin, û li wir heyîn û dewlemendiya xwe têxin defteran
Ma
dixwaze ji rtsqê xwe bibe? Ma ki dixwaze
umrê xwe bike hîç û pûç?' Stranên min umir û risqê min bûn
Hingê min ji kesekî re negot, lê 'min jî dixwest ku stranên min bibûna nemird
Pir kêfa min
at' u merivekî 'Weha tegihtştr, qedtrnas û qedirgiran qedr û qîmetê dide min, umlr û risqê min
Min da pey wî û em hatln Şamê
Ji wê rojê û vir ve ye
ez, dengbêjê mir û began, bûme dengbêjê zana û alimekî
Texmîna, we rast e, ew ctwanmêr Mîr Celadet bû
Berî niha b:i du salan, wî dest bi, weşandina kovarekê kir
Navê kovarê Hawar e û ew xwerû bi zimanê kurdî ye
Bi xêra wî
zimanê me yê şêrin dikeve defter û kitêban
Ew dibêje
If HAWAR kursiya milet e
herkes dikare hilkişe ser û gotina xwe bê]e
" Hema Çi bigire ji bo her hejmarî, ez Jî hf1dlk1ş1m ser kursiya milet û gotina xwe dibêjim
Ev mêrê qenc qewlê xwe bi cîh tîne û stranên me dixe defter û kitêban, 11
Beri niha bi çend saetan, ew hatibu malê
wî hejmara nû ya kovarê
bi xwe re, anîbû

hejmara 24
an
Ma, hun dizanin di vê hejmara nû de Çi heye? Tê de
li kêleka, "Çarînên Xeyam" t strana "Delalê Beriyê" heye
Li b:in sernivîsa stranê jî weha hatiye nivisîn; t) devê Ehmedê Fermanê Kîkî
U De a ê Beriyê
~ yek ji wan stranên ku 1 ber dilê min pir ezîz e
tJH' ' lo dilol
'ay " ','
umrê daê min pê re, de bqjo Vê êvarê min, rebenê
n
E\v hate malê, me bi hev re qahweyek vexwar û em dîsan lt ser Evdalê Zeynikê peyivîn
Ew û birayê
wi Mir Kamiran dev j:i min bernadin Btrayê wî jî alimekî bi dilê we ye Ew jî b pênc-şeş ztmanan dinivise 'û ruhê xwe yê xemgîn dide ber hûntkahtya stranan
Pir caran, em hersê, bi, hev re" rûdinin û, heta stêrJka sibê Gelavêj ji me xatir dixwaze, li ser stranên kurdi dixebtttn
Hûn dtbrntn
ez j,i niha mîna wan d1pey1v1m Û dihêjhn "dtxebitm
i
" Yani ez dtb,êj1m Û ew ji gotinên, min diguheztnm ser kaxi-zan
Ez, carina bi b ûrê, carina jî bi devki dibêjim û pir caran Jî stranan şerh dikim
Lê dtge vê hindê
ev ked û westîn ne bi dilê wan e
Ew her dipirsin û dixwazin her tiştî, digel her celeb kit-kttê, bizanibin
Yanî ew bihn li min, dlçfkîntnl Bi tenê gava M'ir Celadet tifinga xwe ya zivhilî hildigire û dere nêçîra bet û xezalan, û Mir Kamiran Jî
JI bo qesta felekê, dere Beyrûdê, hingê ez hinekî bîhna xwe berdidim
Lê piştî çend rojan

ew dîsan vedigerin
Hingê şev' dîsan 11 me dibin heram Dilan û stran ronahiyê direşîne ser şevên 'tarî
Hingê heyv û stêrik ji dibin guhdarên stranan, Hewa û miqamên cihê disan li
12
pey hev tên
Stran li pey stranê, çîrok 11 pey çîrokê
Ew dibin rûbara biharê
Ya ~ di şevê de
ronî dlçtrûsm
Lê belê, ez divê rastiyê jî bibêjim
digel ku ez dtwestim û pir caran eciz dibim, ji kêfa min re payan tune
Ez bi karê xwe radibim û alim û zanayên miletê me jî qise û gotinên min bi rûmet û rêzdartyeke btlmd, dikin nemtrd
Sed hemd û spasji Yezdanê, mezin re
Lê niha wan serê min xistiye teşqeleyekî, Ew tiştekî ji min dixwazin ku ne -şê aqilan e
Heye ku we ji niha ve fahm kiriye ka ew ji min çi dtxwa ~ zin
Ew ji min dixwazinu ez qala Evdalê Zeynikê bikim
Ew ji min dixwazin ku ez çîroka pîrê dengbêjên kurdan Evdalê Zeynikê bibêjim
Ew dixwazin ku ez çîrokê tevî her kit-kite bibêjim li hûn dizanin, ew wekî din Çi dixwazin? Belê, ew dtxwazin ku ez çîrokê binivîsim û bavê stran û gotinên kurdî Evdalê Zeynikê ji û ve vejînim!
Ez evda ê Xwedê û vejandina Evdalê Zeyrukê!
Ez dikim
nakim, ew dev' Ji min bernadin
Ew bûne pêtên agir û ketine pêsîra min, her û her pitepita wan e
Ma ez çi bibêjim? Ew zulmê li min dikm, bavo 1,
E,z 11 wan vedtgertm û bi qîrîn
dibêjim,
- Lawo

ezbenî, dev ji min berdin
erweki ku me
heta niha k1rlye, vê çîrokê jî ez ji we re bibêjim, hû btntvtsm, Lawo nivisîn ji min nayêt ez hosteyê gotinê me
Ez dikarim bi got
ê dilên ku bûne goristan ji nû ve vejînim
dostan bidim kenîn, dijminan bidim girin
agir û tofanê li ser serê nemerd û xiraban bfbarrmm
,; lê ez ketime 'tor û bextê we
min şerpeze mekin
ez Ji hal 11 hewalê n1visînê tu tiştî fahm nakim
Stran kêfxweşiya min in
dtlan ji roniya çavê min
Feqet, ez bi edeb û terbiya niviski
13
ranebûme
Ez nikarim bilûra xwe bikim qelem
Ez riikartm siya dengê xwe bireşin:im ser kaxizan
Heyran
weha li min mekin
Lê, ew li min guhdarî nakin
Her bi ken û pîqeptq, ew dibêjin
- Ji te pê ve tu kes nfkare bavê stranvan û
dengbêjan Evdalê Zeynikê salix bide
Dengbêj ji hal û hewalê dengbêjan fahm dikin
Eger em niha rahêjin pênûsan û tiştên ku tu 11 ser Evdalê Zeynikê dibêjî, binivîsin, bila yeqina te ji Xwedê be, Evdalê Zeynikê ji dê reng biguherîne û ew ê bibe weki me
yeki ji me
Me heq tune ku em neheqiyê lê bikin
Ew ne mîna me hû
Ew merivê çax û heyama xwe bû
Ki dikare wê çax û heyamê, wî dengbêjê yekta 11 me vegerine? KIr

Ne em
lê tu,
U' do, wan defter û qe emeke nû anîn û danîn ber min û bi ken, bi hev re, weha gotin,
Sala par vê çaxê, ez Evdalê Zeynikê bûm, Ez şah'frê dmê bûm
Şalûrê erdê bûm,
B~'Uê ber pere rQ/ê bûm,
Dengbêjê mîrekî
welatê kurdan bûm, Di hidûdê Ecem de nlnfştî bûm
Mêrekî çê bûm, siwarê hespê bÛl11
, Aşiqê pelê Gule bûm
Xwedayo
min ê çi bigota?
Hawar, hawara Evdalê Zeynikê bixwe hû
Deng, dengê wî bû Ez bêgav mam, min bi hêdîka, bêdeng, defter û qelem ji wan wergirtin
Çare nîn bû
Dewsa bilûrê, min ê niha rahişta qelemê
Wan weha digotlnt
- Ma gotin ne her û her gotin e? Ci niviskî, çi devkî? Herwekî tu dibêjî
tu dê welê ji binMsî
14
Rast e
gotin her gotin e
Digel vê hindê ji
bi ya min, qiseyên niviskî û devkî ji hevûdu cihê ne
Ez mzantm ka ez çawan, bûm dengbêj, çawan bûm
hosteyê stran û kilaman
Ji roja ku min hay ji xwe heye û vir ve, ez dengbêj fm Ez nizanim ka gotinji kû tên û çawan ew li pey hev
mîna yaqût û lûley an , rêz dibin û diçirûsin
:Ez dikarim niha rûnim û, bi rojan ji we re btstrêm, Lê herçî nivisîn e, ew dûrî min e

Qayide
şert û awayên wê cihê ne
Gava ez niha van rêzan dtnlvîstm, b:l tene Xwedê dizane, ez çi eza û cefayê dJxwIm
Ez li ser her gotinê biskeke dirêj difikirim û paşê dinivîsim Welê dixuye, nlvisinji mîna zêrkeriyê ye
Jê rewext, sebir û h
nermendlya zêringerekî divê
Bavê min ê rehmetî her gav digot: gerek her teyr
bi refê xwe re bifire
Dengbêj
bl dengbêjan re
nivîskar bi nivîskaran re Lê mt ên min, vê yekê qebûl nakin
Ew niha kirasê nivîskariyê jî li m dtkin
Ez dizanim, ev kiras ê lt min neyê û ez, ê pir çewtiyan bikim û peyv û gotin ê, mîna stranê
nehe rikin
Ji lewre
hûn divê 11 min û 'kêmaniyê min
negirin
Min çavên xwe bi stranên Evdalê Zeynikê veki
rtn, bavê min ew her gav ji min re digotin
Car bi car
Ma li welatê kurdan kîjan dengbêj bi stran 'û çîroka Evdalê Zeynikê mezin nebûye? Evdal pir û
mîrê me dengbêjên kurdan e
Ji alîkî ve ev yeka ûji aliyê dtn jt, ezji Mîr Celadet û Mîr Kamiran pir hez dikim û ez dizanim
daxwaz 6, niyeta wan qenc e
Loma heta ji min were
ez ê hewl bidim û bixwazim dengê Evdalê Zeynikê biguhez'in1m we
Çima ez niha van rêzan dinivîsim? Ev Ji, disan, 11 ser daxwaza wan e
Piştî 'ku min defter û qelem wergirtin, ez çûm û li quncikekî rûniştim

Qelem di destê min de, ez bi qasî çend saetan fUdrîm û paşê
15
min dest bt çîroka Evdalê Zeynikê kir 'û rêza xwe ya yekemîn weha nivtsî: "wê rojê her tişt bi misteke ronahî û bi dengekî zelal dest pê kir
tl Lê
ev jî ne bi dilê mtrên me bû! Wan weha gotin
Apê delal
beri k tu dest bi vejandina Evdalê Zeynikê dikit divê tu got na xwe jî bibêjî da ku xwendevanên 'me yê ' ezîz bJzanibin ku te ew nivtsiye
Gelo we niha fahm kir' çima ez bi van gotinên xwe yên nehêja we eciz dikim? Lê, ez ê êdî we zêde eciz nekim
Piştî çend qtsên din, em ê vê behsê biblrtn,
Çawan min got, min navê Evdalê zeynikê cara yekemîn ji bavê xwe bihîst Bert niha, hema hûn btbêjtn, bi şêst salan" Bavê min şivan û btlûrvanekt yekta bû
Gava me pez di deşt û zozanan de dtçêrandm, wî bt awaza Evdalê Zeynikê zinar dihelandin, Wî deng
awaz
stran
çîroka Evdalê Zeynikê guhezand min û ez j- wan diguheztntm we, Tê de tiştine hene ku bavê min lê zêde kirine û tiştine hee ku min lê zêde kirine
1
Ma Jixwe gotin
stran û mesele ne weki ava, Firat û Dijlê ne ku di kahn1yê de teng û hûr int lê belê peyderpey kûr û fireh dibin û bi coş diherikin?
Em dengbêj' hevûdu dmasm
Em mîna malbatekê ne
Evdalê Zeynikê bav û pîrê me ye
Em wî Jî dinasin
Lê, herçend elll wi dinasin
ewçend jî em wî nas nakin
Ew di wext û heyama :xwe de dijiya, herwekî met dixwar
vedixwar, digot, hez dikir

her tiştê k meriv dike
dikir
Herçî îro ye
ew 'bûye efsane û 11 ser zimanê me ye
Ji lewre
gotinên ku elll davêjin serê
heye ku b
i tenê perçeyekî biçûk Ji
jiyan
dewr û dewrana wî be
'U 'tiştên ku em lê, zêde dfktn, di esasê X\Ve de
hal û hewalê me bi xwe be
ne yê Evdalê zeynikê
Gotina min a dawin ev e: umrê
16
çûyî venagere
rtsqê çûyî nayê dewsê, dewr û dewrana bihuri bi eynî rengi 11 me venagere
awaz û olana dengê windabûyî rengareng e
Ez ê bi dengê xwe bang 11 dengê Evdalê zeynikê bik
lm û roj ekê ji j
yana wî li me vegerînim Belê
bi tenê rojekê
Mixabin, zêdetirê rojekê ji min nayê
Di vê payiza umrê min de
min ne teqet û ne ji keramet heye ku ez bikaribim ji rojekê zêdetir lêkJm
Em ê niha gotina xwe li vir bihêlin û bên cem Evdalê Zeynikê
bavê deng- dengbêj, stran û stran
vanên kurd, ~
17
18
BERBANG
19

20
Sîpan! Xelatê
Wê rojê her tişt bi misteke ronahî û bi denge A zelal dest pê klr, Roj rojek ji rojên Xwedê bû ûji ser Newroza biharê, 21,tê adarê re
40 roj derbas bûbûn
Stêrtk hê neçûbûn ava
Stêrka sibê Gelawêj
dtçtrast, 'Tava royê hê xwe nedabû xuyan, Lê Ji dûr ve, şewqa çend tirêjên tavê xwe dtqullpandtn ser serê çiyayê Sîpanê Xelatê û, dibiriqin Belê, 11 we derê S"'p,anê Xelatê hebû, çiyayê dostê ewr Û ezmanan, seri bi ~ û dûman
warê dilketî û evîndaran
şêr û pilingan
stanya keserkûr û bextreşan
, Li
Jorê Sîpanê Xelatê
teyrên eylo û baz d1ftrin û didan perwazan, li jêrê jî, çem û av û gelên Mirad û F1rad û, Wanê diherikîn û pêl didan
Dinya bêdeng û sakm, esman, bêewr û zelal bû
Ji xuşexuşa avê û gufegufa sivik a bayê sibê pê ve, tu de'ng tune bû
Ji, wê bêdengî û aramiyê beyan bû ku roj ê bibûya rojeke yekta
bibûya sebebê stran û meselen, nû, û biketa devê dengbêj û stranvanan
Lê belê, ew ê ç'l biqewimiya? Cêyî, rindî
xweşî û dllşad1yê zora neçêyt, nertndt, nexwe şi
ê'ş û keseran bibira? Yan jî, ji belVaj1yê
êş, an, keser û derd
21
'ê 'bibûna du, qat û meraq û, hesreta dilan e bibûya kozeke agir û biketa pêsîra merivan? Yan ji çêyî û neçêyi, rmdî û nertndî, xweşî û nexweşî
kêf û keser I
henek û derd ê biketana nav hev û weki hêlekanan li ser dilê merivên qenc biçûna û bihatana?
Ge 0 wê roj ê dê çi biqewimiya?

Em niha bi vê yekê nizanin
Em ê lê binihêrin û pê re, bi çîroka xwe re herin û bibîn:in ka riya mesele û çîroka me çi rûbarî me dike
Lê be êt di berbanga 'wê roja Xwedê de, dengekî zelal li xuşexuşa' avê û gufegufa bayê sibê zêde bû
Deng
dengê Evdalê Zeynikê bû ku bavê dengbêjan, kok
imê civata kurdan û, qehremanê vê çîrokê bû
Gava dengê Evdalê Zeynikê li dengê av' û 'bayê zêde bû
dengê Evdal bêdengiya dinê 'û hawirdorê xira nekir
Ji bervajiyê, dengê Evd,al bêdengiya dinê neqtşand
Evdal merivê deng bû
ne bêdengiyê
Ew merivê stran
dîlan û govendê bû
Lê çaxa derd û keser lê dfhatin xezebê
mina berbanga wê rojê
bêdengiyeke boş di nav stran û kilamên wî re dihe-
rikîn
Weki her carî, wê rojê Jî, ew beri teyr û raw1rên
Sîpanê Xelatê hişyar 'bû û weha deng da"
Wey lt min felekê,
Feleke, te çûna l'l min weha kir? Te kumê xwe l'l, mm
xwar ktr,
Korbt1na Evdalê Zeyntkêt kalbûna wî lt dinê'
ji xwe re, feyde tl kar kir
Guhdar tî xwendevanên eziz, we JI strana wî derxist
belê
Evdalê Zeynikê kor btî ûjê re tu çare nîn bû
Berî wê rojê bi heft, salan, rojekê ji rOjên Xwedê, ava reş bi ser çavên wi de hatibû Q ew ji şewq û rona
hiya dinê bêpar mabû
Ege em bêkeys nekevin tî

22
wext li me teng nebe, em ê vegerin ser korbûna wî, Lê ne niha
Wê berbangê
ew rabû ser xwe, Ji konê xwe derket
û gopalê wî di destê wî de, li dora xwe nihêrt bêyi ku tu tiştî bibîne
Li serê kiras A şalên dirêj û spî hebûn
Dinya hinekî hûnik bû
Rojeke JI rojên meha gu anê dest pê dikir Kokimê kor, bi hêdîka
li ser kevirekî ku hinekî ji kon bi dûr bû, rûnişt û bi dengekî nizm dest bi stranê kir
Bi qasî bîskekê, heta Jina \\i Gulê ji kon derket û hat' û destê xwe da pişta wî, wî hêdi bi hêdi deng 11 siûd û qedera xwe ya xirab kir
Gulê bi qasî hilmekê 11 ser serê wi sekinî û paşê, li kêlekê rûnişt
wi cUzaru"bû, kesê ku hatiye û 11 cem wi rûniştiye, Gu ê ye, dosta umrê dtrê], şirika deng û gotina kurdi
Bêyî ku Evdal lê vegere,
Jê pirsî,
Gula minê
mehrûmê
Ma tav li me htlatiye?
Wê jî, bi hêdîka
bersîv dayê,
Evdalo
mehrûmo
tav hê li 'me hilnehatiye, lê
xwezî te niha ev xweşiya dinê b dtta
Serê Sîpanê Xelatê bi mij û dûman e û reng bi reng e
Esman şîn, dar û ber hêşîn, av spî ye
Tîrêjên sor ku htltên, qutiya dflê min germ dike
Roja gulanê û tav ji esmên û ji serê Sîpanê Xelatê
bi hêdîka
nêzîkî 11 me dikin
Dinya hişyar dibe

- Gulê
zarşêrtnê, dilê min pê re'yê
Ma ev roja
xweşik ê çi bi me beyan bike? Ma xeberên ku dê ji riya dûr werin
xeberên xweş û rind nebin? Bira
halê Temo û Zînê çi ye? Zarokê wan hate dinê? Tu bûyi dapîr? U ka qulingê bextreş û bêçare 11 kû ye?
- Ko'kirno Evdalo, 11 ber dilê min ezîza
Roj
roja Xwedê ye
Ji Rebbê Alemê hêvî nayê birîn
Li ser vî çiyayê Sîpanê Xelatê
gerek xelata rojeke weha zelal
xweş û rind î xweşî 11 rindî be
Dilê min
dibêje, îro, xweşi 11 rmdt dê 11 me vegerin
Temo û
23
Zînê li konê xwe ne
Gelek pîrejin j~ li wir
li ser serê Zînê ne Zarokê wan hê nehatiye dinê, lê jê re pir wext nemaye, Herçi quling e
di binê kon de, li benda teye
Hêdî bi, hêdî, kesên dm jtjt konên xwe der- diketin û dihatin, 11 ser serê wan dicivin
Evdal û Gulê ne bi tenê bûn
Bi tenê konê wan nehatibû vegtrttn
Li dora wa pir kon û kesên din jî hebûn
Ew çiqas bûn? Kes bi vê yekê nizane
Hin dibêjin
ew bi sedan bûn
hin dibêjin
bi hezaran

Ew pir bûn û rOJ bi roj 'pirtir dibûn
Hemû 'welatê kurdan dizanîbû ku Evdalê zeynikê berê xwe daye çiyayê Sîpanê Xelatê û xwe li sebr
hîkmet û qudreta wî girtiye
Derdê Evdal erdekî xedar bû
Dllê wi bi kul, sebra umrê wi kal bû
Şagirt
berdevk, heval û dostên wî û xelkê welatê kurdan ji xwe li dengê wî girtibûn û hatibûn da ku b1kartbin xwe bigihînin hawara 'WÎ
Ew kor bû ~ lê derdê wî,' kesera dili! wî ne 'bi tenê ev bû
Serpêhatiya ztrkeça wi Meyro û dUketiyê bextreş û şagirtê Evdal Bengîn jî kuleke bêeman xistibûn dilê wî
U di ser de, derdê qultngê birîndar
jî bûbû derdê wi
Roja Newroza şêrîn, wi berê xwe
dabû Stpanê Xelatê
warê Xecê û Siyabendê
Ji roja Newrozê û virve
ew ji Çiyê danekettbû jêr Wî û kesên din konên xwe, bi awayekî peregende
11 ber quntarên ç' yê vegirtibûn
Li kêleka daristaneke rengîn û 1 ber devên kahniyên
pak
Û
şêrin
Evdal ne ji bo Iliniêj û niyazê hatibû Sîpanê Xelatê
Ew ji
bo gotinê hatibû
Gotina ku dermanê dilê WÎ, hekîmê keser û kulên wî û hogtra umrê wî bû wi disan xwe sparUbû gotinan
Dîsan gotin ê bibûna dermanê derd û kulên wi
Gelo Evdal
Evdalê lawê zeynikê kî bû?

Ew ji maleke neçar
lawê Zeynê bû
bêkes Û
sêw!
24
bû, Ew evîndarê' dengbêja, delal Gulê, bavê Temo, ztrbavê Meyro
xwediyê qulmgê birîndar bû
Ew dengbêjê mirê kurdan Tahar Xan, siwarê hespê kihêl Gogerçîn
heval û dostê giregir
beg
mîr û zanayên kurdan bû
Ew dengbêjê welêt bû
Bi dengê wî çiya dihejî, birûsk dtgurî, ava golên girtî û genî diherikî û pelên darên behîf û hinaran hêşîn dibû Ew merivê civat, dtlan û govendan bû, wi b dengê xwe birînên bmndaran dtcebtrand, dilê bêkes
bî û sêwiyan gel m dikir, xewn û xeyalên keçên destgirtî û qelindayiyan d1neqlşand
Ew ne bi tenê dengbêjê merivan? herweha dengbêjê teyr û tilûr û heywan û rawlrarr bû
Bi dengê wî keriyên pêz diçûn çêrê, keriyên xezalan berê xwe didan ava Mirad û Ftradê, refên teyr, bet û qulingan xwe li zozanan digirtin
Di, ser wî re, tu dengbêj hê nehatibû welatê Ku rdtstane
Bê westan, wî b şev û ro
bi meh û bi salan stran digotin
Çawan rûbara nîsanê: b
i xêr û bereket dibarî, çemên Firat - Dijlê bi nazî û delalî d1herfkin, herwekî: wan, dengê Evdal Jî nedihate birin û xwe dtg""'thand serê çiyan Û esmanan
Wî cîh nehiştibû, lê geriyabû, li welatê kurdan
ecem û ereban
,
gav bi gav

Carina li ser hespê kihêl Gogerçîn, carina peyatî, carina Jî bi kerwanan, Ew
ji cîh
der
dever, wext
dewr û dewranên dûr, pir dûr dihat
Wi 11 çolên ereban" bi alîkariya stranên xwe, leylan qulipand1bû rastiyê û av ji qûmê deranîbû,
li welatê eceman
le ser xalîçe û ba1gîhên ecem
wî, şîîra Fîrdewsî kiribû stran û deng dabû ser hal û hewalê "Ferhad û Şêrin
tI Lt welatê kurdan ji, wî 11 ser gora şairê mezin ê kurd, Ehmedê Xanî, 'ruh û, can dabû destana "Memê Alan" û destana din a mezin "Siyabend û Xecê" bi dengê wi bûbû lehiyeke boş û bêdawî
wi pişta xwe dabû xirab- û neI1ndiyê û herê xwe dabû xweşî A rindiyê
25
Lê feleka malkambax x1rabtyeke welê bi serê wî de ani ku ne karê gotinê bû
Pêş- çavên wi kor bûn,
hevalê şewq û ronahiyê kete nav reşe-şeva bêbinî
Paşê J'î zalim û xedaran Meyro û Bengîn
dildarên li ser zimanan
revandin
Loma, dilê wi bi birin, dengê
A A bix bAL
artib - i JII
WI
ZlZ U _,
em U~ ama w1 xwe sp rt ru çyan u
nêzîkî It ewr û esmanan, kiribû

Pênc çiyayên we êt li ber dUê wî pir bi qedir bûn; Ag1li, warê xurtî, serbilindî û biratiya kurd û ermenan; Nemrûd, warê kahniya medeniyetan; Cûdî û Herekol
cihên tartxeke kevnar
îbret û dersan û çiyayê Sîpanê Xelatê
gora Siyaben,d û Xecê', hêlîna evîndar û dilketiyan
Derd û kulên Evdalê Zeynikê 1 serpêhatiya Siyabend û Xecê dihat û dengê wî 1 wir
Ji her cîh û deveri bêtrr, dibû dengê şa ûl û bilbilan
Roja Newrozê wi Gulê
Temo û çend şagirt û dostên xwe yên dengbêj li dora xwe c va din û ji wan re weha got
- G'ulê, mehrûmê, ~1t Temo
lawo
v
dostmo, btrano
i
Şagtrttno, qedirgiran û çelengtno
9
barê min giran, derdê min bêeman e
Iro Newroz et dinya bihar e
Iro rtndt zora xirabiyê dibe
Tarîtî kêm, ronahî' dirêj dibe
Di vê roja bi, xêr û bereket de, li, min beyan bûye, dermanê şevereşa rntn li ser Sipanê Xelatê ye, Bi tenê mezinahî û dilovanî
dar û beri, av û, kahniyên Sîpanê Xelatê dikarin birina ku qedera Tavbanû û Bengîn xistiye dilê min
bikewîne
Ez ê xwe bavêjim bextê çiyayê senê1lind û lê hawar bikim
Ez ê we biterikin1m
qulmgê birîndar ji big1r1m û herim
Hûn 11 min megtrtn, ez

mêrekî kor, bavekî kalû koldmeki 11 ber deriyê gor û gortstanan tm, Cavê min vekirî, lê dinya 11 ber min reş e, Ez ê herim û bang
awaz lê bidim
Heye ku dermanê hekîm û Ioqmanan li wê derê be
Ew
26
dermanê ku, hekim û bijîjka,n nikaribûn btdtna min
heye ku Sîpanê Xelatê bide mm
~ ~
Ne Gulê û Temo, ne Jî heval û şagirtên WÎ
hingê
tiştekî gotin
Wan
bêdeng
lê guhdali kirin
Lê gava Evdal rahişt gopalê xwe û bi rê ket
wan Jî dan pey WÎ
Gulê ket bin milê wî
Temo Jî qulmgê birîndar xiste' destê xwe f heval û şagirt jî 11 kêlekê" wan bi
hev re, berê xwe dan Sîpanê Xelatê
Peyatî
bi stran û kilam
Li her gund û warê ku ew tê re derbas bûn
xelk li wan ctvtyan û guh dan stran û gotinên Evdal
U li her derî
'ye kî 9 duduyan
pêncan
dehan, dan pey wan
Ew bûn pêneeh, ew bûn sed
ew bûn du sed û çaxa e-w gihîştin ber Sîpanê Xelatê seriyê dawîn ê komê riedfxuya, Pêla xelkê rabûbû 1

Gava Evdal xwe gîhand kahntyek ji kahniyên Sîpanê Xelatê û ji ava hûnfk hinekî vexwar û tiha dilê xwe şikand
hingê: wî bîskekê bihna xwe da û paşê destê xwe bir ber guhê xwe û dîsan lê icar ji çiyayê Sîpanê Xelatê
deng da,
De wayê
wayêt sed, ewî wayê, Bira qeda bêye te d'fnyayê
Zeman xay
in e
bi min, re naue, Ez Evdal, im, Evdalê Zeynikê me, Aşiq û senverê kêfê me, Gulek li rûyê dinê me,
Lê îro lt serftrara malê me
,4t~
Em, ê niha
hinekî
li çîroka xwe vebtn il Evdall1 ser çiyayê Sîpanê' Xelatê bthêlm û werin cem bermaliya '\VÎ Gulê A serpêhatfya evîna navdar a Evda
û Gulê
27
28
2
Evina Evdal Û Gule
Evdal dengbêjekî navdar û stranvanê mîrê kurdan Tahar Xan
bû Xortiya wi di nav civat
dawet
dîlan û odên beg û mîran de derbas 'bû
Ew her ro li derekî 'bû
wi her kesî dinasî
herkesî ew dtnast
Ew peyakî zimanşêrtn, bejndirêj û xweşlihevhatî bû
Rûyê wî, her gav
bi ken
Simbêlê wî badayî bû

wi şal û şapikên hewreşîmî li xwe dikirin 'û simbêlê xwe bi rûnê gûz û behîfan dtbmqand
Herçî dengê wî bû
Xwedê ew dabûyê
Şalûl û bflbtl jî li ber dengê wî bêdeng diman
Ma keç û jina ku bikaribûya xwe 11 ber wê bejnê
endam û cemalê bigirta hebu? Ma dengê wî yê mina qedife qutiya dilê kîjan keç û jina bedew venedlkir?
Loma jî ew ji xwe razî û bi cemal û dengê xwe serbilind bû
Ew hosteyê deriyê dilan û kêf û henekanbû
Ew ne zewicî bû û dU tune bû bizewiciya ji~
Lê rojekê ku êdî salê wî li ser sîh! re bû, birûska evînê 11 ser dilê wi veda
HIngê wî, bi rastî, fahm ld
r ka evin çl tofan "û
xezeb e
Ew bi carekê, bi taya evînê ket
Wi
Evdalê dengbêj
roniya heyva çardehê mehê dîtibû
wi keça ermen Gulê dîtlbû
w
29
-~ Begekî bajarê Xamûrê Evdal ezimand bû daweta lawê xwe
Hatina Evdal ji beg re şeref
Ji xelkê re şenaht bû
U ji Evdal re jî jiyan bû
wî hespê xwe Gogerçîn ji tewlê derxist, lê siwar bû û berê xwe da Xamûrê, dawetê
wî hespê xwe rakir çargaviyê û
riya nîvroji bi çend saetan birî
Gava ew gihîşt Xamûrê, meydana dawetê, tiştê ku wî
berî her tiştî, dît, koma govendê û serkêşa wê ya nazdar bû
Serkêşa govendê Gulê, keça, xama û delal bû

Evd, al di cihê xwe de sar bû
Rengê wî, ji heyecan û coşê
qultpt, bû mîna rengê miriyan
Dilê wî pihêt hilavêt
Tiştê ku bi serê Evdal de hatibû
11 ber çavan bû, jê re gotin ne lazim bû
Piştî ku ew ji hespê peya bû û çû ruyê mazûbanê xwet wijê ptrsî
- Begê mtn, daweta we bi xêr
mirazê te bi cîh be
Xwedê umrê te dtrê], lawê te şad û bextiyar ke û
govendê ji mala te kêm neke
Gelo serkêşa govenda 'we ki ye?
- Evdalê ezîz
gotina t,e 11
ser seran û çavan ew Tu bi xêr û xweşî hatî
Te em dilşad
mala me şên, daweta awê min geş kir
Serkêşa govenda me, keça keşîşê ezîz ê bajarê Xamûrê Gulê ye
Em niha çawan û bi kîj an gotinan b karibin Gulê salix bidin?
Ew çllkeke zêr, dtlopeke şîr bû
Porê wê zer û dirêj
bejn û endama wê wekî periyan bû
Bi narînî û bedewiyê kes nedlgthtşte wê
Umrê wê nû ji çardan derketiba û ketibû panzdan
U wir
heş]t serê Evdal çû
Ew
bi rastî
bû, evdal
Piştî çend gotinan û hal û xatir pirsînê
ew çû 11 cem beg
11 ser xalîçeû balgifan ku ji bo mêvanên maqul hat1b - n raxistin, rûnişt,
li govenda meydanê û serkêşa govendê nihêrî û dest bi stranê kir

30
Ez hatime XamûTê~ nav da,wetê,
Min bala xwe dayê, G'ula ,Xamûrê destmal
hildaye
kettue sergovendê
Dile Evdalê malxirab hingê hildavê, te, lê, yamanê I lê t lê ,delalê,
Ez Evdal im
ez dengbêj im,
Ez çoga xwe didim rex çoka aşiq û sazbendan
li ivanê began dibejim
Ji kerba narina dawetê, ez iro him ker im,
him ,gêJ im
Belê
Evdal bûbû evdal û heş J'! serî' çûbû, lê ji destê wîjî tu tişt ned at
Ji ber du sebeban; Gulê keçeke file bû û ew destgirtî bû Qeltn,ê wê ji hatibû birîn û herkesî pê dizanibû
Her çiqas serê Evdal bi ol û oldariyê nexweş bû jt, dîsan, ew ji maleke mtsulman dihat
Misulman, û fila' JI, zû bi zû, keçên xwe nedidan hev û ji hev nedizewicîn
Evdal hunermend û ziravbihîstiyar bû
Li ber dilê wî, file jî bi qasî misulmanan, ermen ji bi qas! kurdan ezîz bû'n
Ev ne bi tenê dengbêjê kurdan
herweha dengbêjê ge ên din ku li welatê Kurdistanê dijiyan
ermen, suryan, keldanan bû jî
Gava ew diçû nav 'kurdên êzîdî u ji alî 01, rabûn û rûniştin,
edet
û ûstl ji kurdên din cihê bûn
şênahiyeke mezin dikete nav wan û wan bernedidan ku Evdal, bi mehan, bi derekî de here
Herkesî qedir û qîmeta Evdal digirt 11 ,J ê hez dikir
Lê niha hal
ne halê dengbêjî û hunermendtyê bû

NIha, hal, ha ê evîna malkambax, kesera dilan bû, Adet û ûstlên halê keçxwestm, zewac, mahrbirin, xe at û dawetê jî
li we êt
ji hesinê pola jî hişktir û dijwartir bû
'Piştî dawetê
Evdal hespê xwe' li tewlê beg girêda û çûlê xwe 11 ma a wî raxist û dest pê kir li dora
31,
ma1a Gulê çû û hat
Agirê dilê wî dijwar bû û ro bi ro dijwartir dibû
Herkes bi agirê dilê wî hesiyabû lê heşê kesî jê tiştekî nedtbtrt; keçik file û destgtrtt bû
Lê qewlê Evdal qew bû: wî' d:ê edete mîna hestnê polatê bihelanda û bigihîşta, mirazê xwe
Em çîrokê dirêj nekin
Evdal lJ bajarê Xamûrê bi cîh bû 'û, bi alîkariya heval û dostan, ew bi bavê Gulê, keşîşê dêra Xamûrê re bû dost û dest bi çûyin û hatina mala wan kir
Bi vi awayi, wî nêzîkî li Gulê kr
Herçî Gulê bû, ew bi vê yekê ne razî bû, çavê wê ne
i Evdal bû Ew bi Evdal qayil nedibû
Lê deng
gotin" stran, û hunerê
i mr jî
hostettya xwe nîşan da
Gulê ne bi tenê keçeke delal û sergovendeke jîr
lê dengbêjeke bi dilê we bû
Nav û dengê wê nîn bû, lê b deng, jîri û hunermendiya xwe
di
nav keç û jinên welêt de
dengbêjeke wekî wê
bi zehmetî dihate dîtin

Vê yekê dilê Evdal hin bêtir geş kir û jê re bû hêncet ku ew stranan bavêje ser Gulê
Ez Ji teyran, teyrê my tm
Ji kerba Gula ,Xamûrê kerr û gêj im
Cî'hê Gulê rûne, ez ê tobe kim, ez' rûnanim, ez nabêitm
Gulê
mehrûmê, Ji erdên, Tahar Xanê heta
Xam û'rê , ahenga 'vira, Min koma heval û' hogiTan_ dîwana mîrê xwe Tahar xanê temam tettkarui;
~
Seba çavên te yên reş û belek hattme vira
Pêşî wî bi tena serê xwe stranên xwe gottn û bi xwe lê guhdarî ktrm, lê paşê gava agirê dilê wi bi herkesî eşkere bû
wi 11 nik xelkê Jî dest pê kir bibêje
Kesi lê nedigirt
xelkê digot
,- Evdal et bi zimanê X\Ve nikare
Zimanê wî ser-
32
best û azad e
lê mekin
qusûr, ew dengbêj û hunermend e Û
wekî her hunermendî hinekî dîn1k e
U'
meriv çi bike?
agirê aşqê germ e
dikeve nav hestî û çerm e, ne dibê fedî ye û ne jî şerm e
Bav û diya Gulê ku bi agirê dilê Evdal hesiyabûn
ji digotin,
~ Qîza me bi qîma xwe ye
Ew çi
çawan bixwaze,
emê welê bikin

Her tişt li ser Gulê bi xwe mabû
Lê Gulê nerm nedibû
Rûyê wê bi ken
gotina wê na bû
Ew weki hesmê pola bû
Evdalê reben nikaribû tu tiştî bikira
Ji gotin û stranan pê ve
çiyên wî hebûn? wi
jî tiştê ku ji destê dihat dikir; hîn bêtir zor dida
gotin û stranê
- Min bi stranên xwe teyrê baz kiriye bilbil
şêrê
dirende kiriye pisîk
Ma ez ê nikaribim vê kaftrbavê bînim rê?
wî digot
U Evdalê evdal welê kir ku şevekê
li mala
bavê Gulê
li oda mezin, di nav mêvanan det wî bang li Gulê kir ,
ew da anîn û di nav mêvanan de da rûniştin û dest pê kir stran avêtine serê
Herçî Gulê bû, wê şerm nekir û rojê ba neda
Ew lt maleke serbest mezin
bûbû û bi xwe bawer bû û bi têra xwe hebû, Dewsa ku ew bireve, here aliyê Jinan, wê bi xurtî xwe ragirt û bersîva Evdal da û wê jî dest pê kir stran avêtine ser Evdal
Li wê derê şerekî yaman hate pê û Evdal û Gulê bi dengan avêtin ber hev, Evdal hoste û bi tecrube bû
"Wî bi hêdîka
bi nermî gotinên xwe 11 hev danîn û 11 pey hev rêz dikirtn
Gulê ciwan, xurt Û biaqil bû, wê pir zû gotin 11 hev danîn û hê gotina Evdal nedtqedtya, bersîva wî dida
Kesekî hê: şerekî weha xweş Û

geş 11 wê deverê nedîtibû
Ji aliyê jtnan, diya Gulê û jin û keçên din
jî hatin odê
Ji kêfa guhdaran re payan nîn bû
Wan bi çavan li dengbêjan dinihêrin û bi guhan li wan
33
guhdarî dikirin
Û Evdal digot,
Gulê, tu were, em herin mala me ye,
Ji te re daynim bahlif-doşegê çi dare ye
Her kî xelkê got, ''îkrama Gulê Ji te re çi ye?'
Ez ê bêjim
"ikrama Gulê ji serê heft bavê 'min zêdeye
"
Gulê di bin gotin û qisên Evdal de nedi
ma û hema lê vedigerand"
Evdal çavê min reş e, bela ne,
Min rojê' heft ceran bi kUê sibhanê kU danet
Lê heft dengbêjê m,tna te, jt bo minjtnên xwe' berdane
Evdal9 dîsan, davête serê
Gulê, mehrûmê, hatime Xamûrê, defê nav dawetêt G'ula Xamûrê xemUl bû, ketibû " sergovend
êt
Dilê min Evdalê Xwedê çiqas kere
Bêyi ku, Gulê bisekine û 11 gotinên Evdal guhdarî bike, wê hema gotina xwe digot
EvdaL mehrûmo
Ji, axa m,irê te Tahar Xanê heta vira,
Xwîna sor neqiti ser keviran
De 'tu wereji min re bêje "xunşkê",
L
J>,tm- "l b
"

z UCJ , o
,u-a
Qebqeba wan, hema C bigire, heta, deetê sibê dewam kir
Her du alî j- ji xwe razî bûn û heta destê
34
,
E
sibê
bê westan
hevûdu birin û anîn
Evdal, wekî teyrê bazê ku xwe berdida ser nêçîra xwe, êrîş dibir ser Gulê
Gulê jî
weki bllblleke xurt û nazdar, bi dengê xwe êrîşên wî dişikand û bi gotinên xwe dilê
wi dikiztrand
Wê şevê, Gulê b xurtî li hember Evdal sekinî, lê
pêla dilê wê ji ber b Evdal qulipi
Gotinê
dîsan, bi ya xwe 1drlbû; Gulê nerm bûbû
,
Gotin, stran û hunerê alikarî li Evdal kir û ptştt keft û lefta çe d mehan, Evdal bi ser ket
Gulê got "erê
" Ew roja ku G lê got "belê", bilûr û tembûr ji destê Evdal neket û wi ji hilatina royê heta dîsan hilatmê stran gotln
Piştî ku Gulê gote 'belê"
êdt tiştên din bi leza birûskê li pey hev hatin
Qelinê destgirtiyê Gulê li mala bavê lêwik hate vegerandin
Sozê Evdal û Gulê hate b
:IrÎD
Evd
a
Gu ê, dê û bavên Gulê, heval û

dostên her du seriyan 1 hespan siwar bûn û çûn deverên Evdal, erd, qesr û qonaxên Tahar Xanê
Li wê derê, Tab
ar xan ji Evdal û Gulê re daweteke welê 11 dar xist ku xelkê b mehan û bi salan qal kirmê
Daweta Evd
al û Gulê sê ro],
sê şevan dewam kiri Dengbêj
stranvan, çîrokbêj t tembûrvan û govendkêşên welêt, j her alt, hatin dawetê
Neçar û feqîran sê roj û sê şev xwarin û vexwarin
Şeva Sisiyan, derengê şevê
Tahar xan bi xwe, Evdal û Gulê xtstm oda zavê
Dotira roj
ê
gava Evdal ji xewê hişyar bû
wi şeş dilop xwîna sor : 1 ser ça rşefa spî dttm, Pişti ku wî xwe şuşt hemamiş kir û simbêlê xwe bada, ew daket bexçe û li wir
wî d kewên spî û pir X\Veş JI kewên Tahar Xanê ftrandtn û ew azad kirin
Wi bi qasî bîskekê
11 bexçê
firîna kewan nihêrt
Wî, 11 wir, JI Yezdanê pak hêvî kir ku Yezdanê mez1njê re lawekî bide
35
Niha em ê evîna Evdal û
Gule li vir bihêlin û werin cem lawê wan Temo
36
S Temo
Piştî dawetê, roj bi roj
zik
li Gulê mezin bû, za rokekî li rê bû
Evdal bi kêf bû
Ew dihat 11 dora be

maliya xwe dizivirî û bi ken stran digotin
Evdalê bibûya bav
Bi rêdana Yezdanê dilovan, ew ê bibûya bavê lawekî
zarok hê nehatibû dinê
lê wi stran
li ser "lawê" xwe çêkiribûn
Neh meh û neh roj û neh saet û neh deqîqe, piştî dawetê, Rebbê Alemê lawek da Evdal û Gulê
Gava lawik hate dinê, Evdal ne li malê bû
Ew
tevî Tahar xan, çûbû seyd û nêçîrê
Bi dû bûytna lêwik re çar rojan, Evdal ate malê
Li ber derî, wî dengê zarok bihîst
Hingê hindik mabû ku ew ji kêfa bifiriya
Ew kete hundir, oda Gulê û çû eniya Gulê û her du çavên wê ramûsandin
Paşê wî zarok Ji hembêza Gulê wergirt û kir hembêza xwe û lê nihêrî
Hingê
Q
ulêjê re: got
- Evdalo, mal bt nûro,
Xwedê mirazê te kir, tu
niha bûyî bav, bavê lawek
i
lawekî ku li ser rû
çirûskên nûrê dtbarm
Evdall! vegerand
- Gulê
mehrûmê
ma rast e? Xebera
te ya pîroz
37
rast e
ev niha lawik e?

Evdal bi guhên xwe bawer riedtklr
wî xwest bi çavan bibîne û destê xwe avêt paç û pêçe kên, zarok û ew jê kirin û li nav şeqan nihêrî
Li wir, di nav şeqan de; bilik û gunikên biçûk weki sê libên zey tûna hêşîn dibiriqîn
Hingê Evdal j1 xwe çû, bi qasî bîskekê, bêdeng, li lawê xwe nihêrî û lawik li hembêzê, çû 11 kêleka nivînên Gulê rûnişt û hêdî hêdr, ji ber kela dilê xwe
giriya,
Evdalê sêwî Û 'bêkes: bûbû bav û xwedî lawekî
Ma heşê we jê dibire ku Evdal di rojeke weha pîroz de
bê stran bihewiya? Naxêr
Pişti k' ew bi têra xwe girtya
wî dest bi stranê kir
Hay lê Gulê
canê Gulê, şemamoka ruh û canê, Lê
lê
Gulê canê, diya lawê minê, lê, lê, Kevoka sere btrcanê,
Sêva sorê ser dikanê,
Kes vê sêvê nade destê xortên ku, pê nizanê,
Hay lê Gulê, roniya çavê minê, diya lawê minê
Wi
bi dûr û dirêjî
stran avêtine ser jina xwe, 'bi dû re
ew 11 lawê xwe vegerî, lawik hilda û wekî ku ew pê re dipeyivi
bi dengekî zîz û melûl, wi dest bi, xeberdanê kir t
- Lawo, nûra mala mino, kurê Evdalê sêwiyo, delalê diya xwe Gulêyo
'
tu bi xê û xweşî, li ser seran û çavan hatî
Em 11 hêviya te bûn
Tu hêviya
me yî Te mala me ya feqîr şên û g:eş kir
Th, ji pişta min ketî

tu dê bibi pişta min
Tu dê bibî heval û dostê min, roniya çavê min
Tu dê bibi timsalê xurtî
A
riyê Tu d -
bi Dim A A - h-
u clwanme r -
- - - e, -' - - - -', 'U, zamna xwe" ro:na -1
b1reşini ser mala me
Tu dê bibî nêçîrvanekî jîr û dengbêjekî yekta, Ji
bavê xwe jî çêtir û rindtir, Tu
- t
& b rt di rbî al l dU
e, mma eyre _-az xu- u - U --1D9 mina ş
u e
,0-
3B
d
ê
van û bfhnflreh bî
~ LaVl'O
çira mala meyo, de xwe bilivîne, bilezîne ta ku zû mezin bibî
Her çiqas Gulê digot ku i ser rûyê lêwik nûr
dibarî, lê Evdal çilka nûrê li ser ruyê lêwik nedît
Ew zarokekî reş û hinekî gulover bû
Çavên wî hê baş venebûbûn, yek htneki vebûbû
yê din hema çi bigire
bi temamî girtî bû
Lêwik xwe di hembêza Evdal de dûtvand, Evdal destê wî yê biçûk xiste nav destê xwe û bi qasî bîhnekê li lêwik
nihêrî
Em nizanin çima, lê hingê hilma tirs
xofekê kete dilê

Evdal
- Lawo, stûna mala mino
singê konê mino
lawo
b a qeder û siûda te baş û qenc be, bila felek rû ji te banede û çerxa feleke li ser te xwar nebe
Em ê li vir bibêj n, heyf
hezar heyf
Ji ber ku daxwaz û mirazên Evdal bi cih iehattn, tiştên ku wî lê hêvî dtkirin, rieqewtmîn, Jl bervajtyê, ttştên ku wî nedlpan, qewimîn
Felekê
dîsan, kumê xwe xwar kiribû û çerxa xwe b:i lez diztvtrand,
Pişti ku lawik hate dinê, meclîsa Tahar xanê geriya ji bo ku zêr û xelatan b din lêwik
û navekî lê
bikin
Tahar Xan got,
- Evdalo
zarşêrino, dengxweşa
em navekî 11
kurê te kin,
Mîre mtno, xwedanbext û merivê çêyo, li
meclîsa, te
ez ne bi destê X\Ve me
Tu bi qîma, xwe yî
Hema te çi nav lê kir
navê lawê min, xulam û koleyê te
ew e
- Eger welê ye, em ê navê wi bikin Temo
Temo,
kurê Evdal
BUa Xwedê umrekî dirêj û mirazekî 'rind btdiyê
Bi wi awayî

navê lawê Evdal û Gulê bû Temo
Roj û meh derbas bûn, lawik
hinekî bi ser xwe de hat û rengê wî vebû
HIngê Evdal û Gulê dîtin ku di çavê rastê yê lêwik de şaşiyek heye, çav bi temamî
39
venabe 'û, li serê spiyek heye
Wan lawik birin ser hekîm û doxtoran, şêx û, melan
lê ji çavê Jêwtk re tu çare nedîtin
Law
ik her welê m,a
Bi vi terhî, lawik hinekî din jî mez
in bû
Lê, îcar joll
ew nikaribû bi-
peyivtya
Heta salê wî bû çar-pênc j'i, wî bi tenê çend peyv wekî "bavo, dayê
apo, evdo
,;" dtkaribû bigota
Evdal
dengbêjê dengbêjan pir bi vê yekê dêştya
Ew bi xwe hosteyê gotinê bû û ji devê lawê wî jî gotin dernediket
Lê b d û salekê, salek û nîvî re t bi
carekê
zimanê lêwik: vebû û dest bi xeberdanê kir
Icar j:î, kesî nikaribû ew bida sekinandin
Hema çi dihat ber devê wî
wî digot 'û, li kesi guhdarî nedikir ~ Qise' û gotin nediketin sere wî
Evdal dtktr, nediktr, nikartbû tiştekî pê bida fahmkirin
Gava umrê lêwik
gihîşt neh-deh salan, Evdal mele û mamosteyên xwedî tltrn
irfan dan anîn da ku ilim û terbiye fêrî Temo bikin
Lê Temo û ilim û terbiye geleki ji hev dûr bûn

wî ttştekî fahm nedikir
Heşê wî ne kemfiî bû û ne Jî' li gora 'umrê wî bû
Temo gêjokî bû
Ne bi temamî gêj~ lê nîvgê]
Wî' tiştên, s:ivik 'û basîd fahm dikirin
Lê ne zêdeyî wan
Halê Temo bû kul û derd û kete hundlrê Evdal
Evdal hunermend bû
Fikirin, bîrbtrtn, aftrandin, pêkanîn hunerawî bû
Heş û mê]t her tiştê \VÎ bûn,
Ew hunermendekî yekta bû
wî ji tiştên çewt
şaş û nîvçe hez nedikir
Lê niha lawê wî, lawê ku wî ewçend jê hêvî dikir
weha bû,
Evdal rûdtnişt 'bi saetan" bi rojan
Jê re stran û çîrok digotin da ku ew' Jî hin be
Lê bala Temo ne li ser stran û çîrokan b,"
Evdal ew bi xwe re dibir seyd û nêçîrê
Lê 'WÎ ne ji seyd û nêçîrê tiştek fahm dikir, ne jî jê hez dikir
Evdal ew bi, xwe re dibir meclîsa Tahar Xanê, lê yan Temo direvî, diçû malê, yan j,i dihat, wekî zarokekî dergûşê, li ber çoga Evdal rûdtntşt,
40
Hasilî kelam, em dirêj nekin
her çi ku Evdal ji Temo hêvî dikir
bervajiyê wî bû
Temo ne bû tîmsalê xurtiyê
ne bû alim û
zana, ne jî bû dengbêj
û nêçîrvan, Temo bû lawekî nerm, dilovan
dilgerm û bêdeng
wi jI Evdal û Gulê pir hez dikir
bê wan nedibû

Ew li kû bûn
Temo jî li wir bû
Wî jlteyr û tilûr û heywanan pir hez dikir
Bi
xêra
Temo hejmara axur, pîn û qefesên mala Evdal û Gulê zêde bû, Evdal Gulê û xelkê din nikaribûn tiştekî, serrast, bi Tem
a re bipeytvtn, Lê Evdal û Gulê jêre çi digotin, Temo ew bi eth dianî
Bi
vî terhî, Temo mezin bû, kete sala bîstan
Evdal û Gula reben ê çi bikirana? Ma ji destê wan çi dihat? Wan cîh nehiştin
se ~ danê
lê tu çare nin bû, Bextê wan weha bû, Felekê carekê çerxa xwe 11 ser serê wan xwar ztvtrandtbû
Wan ji awê xwe pir hez dikir
lê hal û hewalê Temo jî agir bera dilê wan dida
Temo lawê wan bû
Bê 'Temo kesekî
wan nîn bû
'Bi d
Temo re, Gulê bi nexweşiyê ketibû û
hew jê re zaro dibû
Hêvî û daxwaza wan ew' bû ku gava rojekê ji rojên Xwedê
wan serê xwe daninaxa goran, diyarê rehmetê
ew warwenda û kurdûnde nemana û zarokê wan bida ser riya wan û li ser erdê dinê hebûna wan btdomanda
Lê halê Temo jî ne tu hal bû
Lê jîn e, bi dek û dolab e, çaxa Temo rojekê quImgek li ber devê avekê" dît û ew girt û anî malê
tiştek lê qewimî, Wekî ku ew' ji xewneke kûr û dirêj
hişyar be
yanjî bi carekê veciniqî be

ew' hinekî bi ser xwe de hat
BI tenê' hinekî
Lê ew hinekî jî qîma gelek tiştî kir
Temo quling
hema ç bigire, salekê beri wê roj a ku Evdal berê xwe da Sipanê Xelatê, dit, Quling b1lindar b -
Temo û qu 1ng bûn dostên hev
Dost1ya wan alîkarî li Temo kir û ew bêtir bû serwext û bêtir
41
li hal Û hewalê bavê xwe yê kor pirsî û li serê fikirî
Hingê 'umrê Temo gthîşttbû sîhî 'û spiha ser çavê wi hîn mezintir bûbû
Bi qasî mehekê bi dû dîtina, quling, re
Temo dest bi doza mêranî û zewacê ktr, wi ji diya xwe re
diya 'wî ji Ji Evdal re got
Hingê ji kêfan, dilê Evdal mina, deryan rabû
Bask û perwaz tune bûn ku Evd,al pê biftnya, Evd,al Û Gulê
hema di cih de, keça dostekî wan ku bi xwe ji dengbêj bû
ji Temo re xwestin û keçik anîna Evdal ji taqetê ketibû
W'" imkan nin bû ku daweteke mezin li, dar
xista
Wan 'bi daweteke biçûk Temo û keçik ku navê wê Zînê bû
zewicand "
P ştî çend mehan, Temo simbêl bada 'û hat mizgi
da dê - bavê xwe; Zînê giran bû
Htngê
Evdal kumê xwe firand 11 rahişte tembûr û, bilûrê
Berbanga wê roja ku Evdal, 11 ser çiyayê Sîpanê Xelatê, bi dengê xwe roja nû hişyar kir
herkes li benda, we mdandma Z~ ê b' ~
J'ê re ne roj
lê saet û deqîqe mabûn
Em ê Temo û Zînê jt
niha

11 vir berdin 'û 'Werin cem quling û li hal û hewale wî binihêrin
42
4 QUHng
Gava Tema Û hevalên 'wî quling li deştê dîtin, li ser korbûna Evdal re şeş sal derbas bûbûn, Temo û çend hevalên wî li deştê bûn
Bihar hatibû, der û ber hêşîn bûbû
Dinya kirasê xwe yê rengarengt 11 xwe kiribû
Bihneke xweş ji erdê radibû û hawirdor vedigirt
Xelk, gundî û eşîr hazirî d kirin ku hi1kişiyana zozanan, cîhên hûnik û h avtngeh an
Xelkê digot
- Bihara welate Kurdistanê li kesî guhdarî nake û ew weki keçeke nazdar, di nav kincên rengî' de
tê, û ronahî 11 welêt direşîne
Xelk û eşîr' li ber haziriya zozanan bûn
lê teyr û tilûran berî xelkê, xwe bi zozanan gthandtbûn
Ew ji deverên germ û dûr hatibûn û xwe li benî, deşt
çiya, zozan Û daristanan girtibûn
Teyr, çivîk, legleg, hacereşfk, quling û h
w
d
ref bi refhatlbûn
Temo quling rojekê ji wan rojê biharê dît
Ew û hevalên xwe di ber avekê re dibihurin
Hingê wî dengê teyrekî bihîst û xwe li deng girt
Piştî sed, sed û pêncî gavt, wi qu tngek li kêleka sazê dît
Digel ku quling jî Temo dit, ew nefiriya
wî 11 çavên Temo
43
nihêrî
Temayê pepûk
i cîhê xwe mat ma û wi jît bi qasî bîskekê
li çavên quling mhêrî

Xwedayo
ew çi çav bûn! Coteke çavên belek" xweşik û melûl
Temo ber bi quling, bi hêdîka, çû, û li ser serê 'wî sekinî
Quling nefiriya
Wî xwe livand, lê nefiriya
Hingê
Temo sêlika dest xwe ku tijî kulîlk û çîçek bû" danî erdê û li ser tottkan, li ber quling rûnişt û destê xwe bir ser serê wi û ew' hêdî hêdi' mist da
Quling kir qîrîn
lê dîsan ew neftrtya
Temo tiştekî' jê dernexistû wî bang li 'hevalên xwe kir
Gava hevalên wi hatin û li
quling nihêrin, wan fahm kir ku quling birîndar e
Her du baskên quling JI şikestî bûn û birina wî pir xedar bû
Temo quling da bin çengê xwe, sêlika, kulîlk û çîçekan
jî xist destê xwe yê din û wi û hevalên wî berê xwe dan, malê
Li malê
Evda " Gulê û Temo li ser quling civiyan
Evdal destê xwe li nu kil , çav
seri
stû, pişt Û lingên quling gerand û paşê, bi her du, destan, her du basken quling mist dan
Hingê qîreqîr bi quling ket
Evdal quling nedidtt, lê derdê quling fahm kir,
- Lawo, Temo
quling btrtndar e 'û birina wî xedar e
Ew hew sax dibe û baskên, \VÎ hew dicebinn
Lawo, ew ji mîna mtn bi derd û, kul e
Ez j'1 ronahiyê, ew ji firînê
ez ji rengê b:iharê, ew ,jiştnahiya esmanan, bêpar e
Qedera me yek e
Ez însan; ew teyr
lê siûda me wekhev e, Lawo

Temo
de bilezîne, tu û diya xwe derman û, giyayên şîfay'ê bînin" em daytnin ser perwaz û, birînên quling
Heye ku Rebbê Alemê li gunehê wî binihêre
şifayê xêrê btdtyê
Ne derman û ne - i giyan alîkarî li quling kir
Ew her welê ma, Evdal
Gulê û Temo ew birin ser hekim 'û doxtoran jî
lê digel vê yekê, jê re çare nedîtin
Hevalên quling" teyr û t1lûr 9 li ser serê 'wan difirin
dixwendin û didan perwazan
Lê quling! reben her li ser' erdê bû Evdal bi q ling dêşiya û digot
44
- Gulê
mehrûmê, ma tu halê quling nabînî?
Refên teyr û qulingan gihîştine zozanan
Feqet qulingê me yê bextreş bi şûn de maye ji heval û ho-
giran
Gulê, teyr bi refê xwe re mesûd û bextiyar e
Herçî quling e, bê deşt û zozanan nabe
Quling teyrê deşt û zozanan e
ew xwe li deşt û zozanan digire
Ew teyrê biharê ye
Bihar li kû, ew 11 wir e
Sibê roj
gava germiya havînê û serma zivistanê hi ser me de hatm, hingê em ê çi bikin? Hingê em ê qulingê belengaz çawan bihewînin û ji mirinê star bikin? Mehrûmê Gulê
em divê jê re çareyekê bibînin
Ew li çare digerîn
lê çare bi xwe, bêyî ku wan hay jê hebe
hate
Çare tembûr, saz, bilûr, dengê ENdal û Gulê û germiya malê bû

Quling, mîna meri-
vekî, hÛlÎ 'malê û wan bû
Temo ew dibir ' deşt û zozanan digerand, Gulê ew dişuşt û pak dikir û Evdal
jî pê re dipeyivî tl jê re stran digotin
Ew bûbû lawê duwemîn ê malê Mal bûbû çar kes
Wan wekî mert-
vekî li quling fedfktrtn
Evdal û quling bûbûn du dostên qenc
Gava dengê quling bi guhê Evdal nediket
ew eciz dibû û gava Evdal li tembûr anjî li bilûrê nedixist û stran nedigot, Îcar
quling dikir qîreqîr
Pir caran, Evdal quling digirte hembêza xwe û pê e dipeyivî
Quling
jî
ji halê xwe razî
bêdeng, li dora xwe dinihêrî
Tiştên ku Evdal jê re digotin, bêtir
li ser derd û kulên her duyan, bû
Evdal weha digot
- QuHngo
çavbeleka
perhêşino
, , dinya, diny-
ayeke malkambax e
ew, dinya derd û kulan e
Kêfxweşî ~ bextlyari ji min û j te dûr e
Ez kort tu
baskşikestî yî
Ez di nav şeveke xedar, tu di nav êşekî yeman de yî
Eger çavên min ronî, perwazên te sax bûna, me dê rindî, comerdi û bextiyati nişanî

dinya kambax bida
Me dê bi dengê xwe gulveda, deşt û berrt btxemilanda, esman bi reng
45
bmeqtşanda, teyr Û çivîk têr bfktra, şadî û bextiyarî bida meriv û tnsanan
Eger dinya min tarî, perwazên te giran nebûna, me dê heft welat û dêwel bida bin ling û perwazên xwe
A me dê deng bida ser hal û hewalê dinyayê
Pir caran jî
Evdal stran davêtine ser quling
Qulingo
pertiêşino,
Rabe baskan li hev de, serê çenga,n pê re
btheiino, Xwe bi hekûn û doxtorên
dinyayê tev btgthino
Hekîm û toxtoran II min bictuiru»;
Her du çavên min kor ~ tu sax- bike her du baskên şikestino, Baskên xwe bi ça,vên min ve bicebirino,
Şalûl û bilbil lt halê me dixwin
o
Hatina quling hêz û quwetekî nû da Evdal~ Dilê wî yê birîndar dîsan geş bû û devê wî vebû"
Qulingjê :re bû hêncet ku ew derd 'û keserên xwe bike stran
wi stranên nû çêkirin
ên kevn, bedewtir û, xweştir ktrtn, Evdal hunermendekî kevn 'bû
Xebat 'û, tecrubên salan deng, ûsllb û awazeke taybetî dabû Evdal
Li welêt herkesî bi vê yekê dizanibû
Kê digot
bila bigota
11 her derî stranên Evdal diyar bûn
Xelkê stranên wî û yên de
gbêjên din, pir bi hêsanî
Ji hev derdixistin

Tu dengbêj û stranvan ji aliyê deng, awaz, ûshb û 1 hevanînê, nedtgtşte Evdal
Evdal hoste bû
Ew hosteyê hestan bû
Hostehtya 'wî
ji ev bû; dengekî xweş û kemilî, guhekî vekirt, ruhekî bi coş û heyecan, sebir û taqeteki yekta
meraq û daxwazeke' germ Û ji karê xwe hezkirin
Bi kurtayî, her tiştê WÎ l1hevhatî û bi aheng bû,
Korbûnê ew xist, Serpêhatiya Bengîn û, Meyro ew hin, bêtir xist Demên dawîn bîhna wi teng
nefesa
46
wî çikyayî bû
wî her stran digotin, lê ne bi heyecan û kela, kevn, Tişt,ê herî gtrtng jî, wî weki berê nikartbû stranên nû 11 hev bianiya
Heta ku quling hat
Quling ronahî reşand şevên Evdal ên bêbinî û ruhê wî vejand
,; Dige gotin û
stranê
baweriya dengbêjê hoste jî
ji nû ve, xurt bû
Disan wi dest pê kir, bawerî bi xwe û, bi dengê X\Ve ani
Herweha bi ronahiya tavê Jî
Gerçî ew kor
"" 'b
lê - t
b ti birî' k - d'
UU, ,', wl tu can-awe ya xw-e nenm xu wr ae,
rojekê, bi çavan roniya tavê bidîta û çavên wî dê, ji nû ve, vebûna
Hattna qulmgê birîndar vê bawerî û
daxwazê ji xurttir kir,"
Gava ku wî berê xwe da Sîpanê Xelatê, wî xwest ku quling jî pê re bûya

çaxa ew bi rê et, wi weha
got
- G'ulê, mehrumê, Temo
lawo, heval û dostmo
,
ez 11 rê me, ez ê stran bavêjime ser qedera xwe û quling, ez ê deng bidim ser bextê 'reş ê Bengîn û Tavbanûyê
Edî heta çavên min û baskên quling
sax: nebm û ez xebereke j1 Bengîn 'û Tavbanûyê nebfhîstm, ez hew ji Sîpanê Xelatê dadikevlm
Ez ê her stranan bibêjim û xwe li quwet û hîlaneta çiyayê Sîpanê Xelatê bigirim
Em niha çîroka quling ji li vir biterikîntn û ve-
gertn cem Evdal û çiyayê Sîpanê, Xe atê
47
48
PIşTI NÎVRO
49
50
Evîna Siyabend û Xecê
Ro hilatfbû 'û, hatibû li ser serê çiyayê Srpanê Xelatê seklnîbû
Tîrêjên royê li ser eniya çiyê dtçtrûsin
Ava kahnî û golan dibiriqîn
Dinya, germ, hawirdor hêşîn bû
Wîçewîça teyr û Çivîkan ji dorall û daristanê, dihat, Bthneke xweş hawirdor girtibû: meriv' bi bîhna çiçek, ku Ilk, dar û ber sermest dibû
Sîpanê Xelatê di nav xweşlyeke ecêb de bû
We digot qey haya çiyê ji ziyareta Evdalê zeynikê 'û xelkê hebû û çiyê jî" ji bo wê ziyaret û
td
il d
bû
sen' ane, xwe xem anr 1 : u

Lê çi mixabin ku Evdal ew xweşî nedidît
Xelk ji konên xwe bi dûr ketibûn~ Ew htlklştyabûn serê ç:iyê û li wê derê bi, awayekî peregende, kom bi kom rûniştibûn
Çûyin û hatin û tevger xurt bû
Ji her derî deng bilind dibû
Zarok, xort
keç, jin, mêr, kal û pîr ketibû n nav hev
Mîna gotina gottnbêjan, 'wê rojê dê weledê xwe avêtibû Roj bi roja mahşerê dima
Serê çiyayê Sîpanê fireh bû
Ew 'bi dar û ber bû û li navendê jî goleke' hûr û pir xweş hebû
Ji bin gir
zinaran kahniyên avê derdiketin 'û, bi rengekî spî weki berfê dthertkin
Ava
51
wan ewçend sar bû ku destê mertvan tê de dltevizî,
Li wê dere, kOTI1a mezin" bêguman, koma Evdal bû, Gulê
Temo
heval û dostên wî, şagirtên wî û, gelek kes ji xelkê, li dora Evdal c:iviyabûn
Evdal û dora wî, nû, Ji ser firavînê rabûbûn
Herçî xwarin bû, serê Evdal pê ne xweş 'bû
wi qirna xwe bi partyekî nan dtanî
Li ser sifre û di dîwan û 'meclisên beg û mîran de jî
, wî bi 'tenê pariyekî nan dixwar, Xwarina wî ya rojane weha bû: taştê, pariyekî nan; xwirînî, taseke şîr û nanê hlşklwî 'nanê xwe dixist
nav şîr]; firavîn, pariyekî nanê nerm, seriyekî pîvaz, hinekî sebze
çend tîke goşt û taseke mast: şîv J 'pariyekî nanê nerm, çend seri' penîr taseke dew û eger hebe, hinekî pîvazê hêşîn
Mîna paşîv jî wî hinekî şîrinahî dixwar
Wê rojê jî, 1,Vî firavîna, xwe bi nanê nerm, seriyekî pîvaz" sê tîke goştê xaşayî, hinekî sebze û, bi du tasên biçûk mast kir'
Bi dû firavînê, re, 'wan xwe spartin siya çend daran û ew 11 wir, li ser cil û kulavan, rûniştin

Bi qasî hefteyekê bû ku Evdal" her piştî nîvroyê, rûdinişt û Ji şagirtên xwe re qala "Siyabend û Xecê" dikir û çîroka wan" ji nû vet li gora xwe, vedtjand
Geh bi stran; geh bi gotin
Li ser "Siyabend Û Xecê" wi weha digot
- Şagtrttno, xortên çelengtno
destana Siyabend û, Xecê li ber dilê min pir ezîz e
Ew mîna Iehiyekî diherike
Ew avahiya miletê me, rê û rêçên tarîxa me ye
Di nav 'wê destanê de, meriv milet û insanê kurd baş dibî e'
Adetên me û rabûn û rûniştina welêt tê de baş dtxuytn
i
Sîpanê Xelatê hêlîna Xecê û Siyabend e, bi serpêhatiya wan navdar e
Min xwe bêsebeb 11 S""panê Xelatê 'negirtiye
HQn bi serpêhatiya Bengîn û Tavbanûyê dizantn, Serpêhatiya wan jî, hema çi bigire, mîna
52
serpêhatiya Siyabend û Xecê ye
Lê min JI xwediyê erd û esmanan tikayek heye ku dawiya Tavbanû û Bengîn nebe mîna dawiya Siyabend û Xecê
Evdal hefteyekê destana "Siyabend û Xecê" gotibû û ew êdî hatibû dawiya destanê
wi hêvî hebû ku destan wê roj ê blqediya
Keneke li ser rû
wî hêdî 'hêdi serî li dora xwe zivirand, gopal û bilûra xwe danî kêleka xwe çend caran serê xwe hejand û dest bi gotinê kir,
- Ez, we nabînim, lê bi we dthestm
i
Kor bi, tenê
net korbûnî tenêbûn e
Feqet ez ne bi tenê me
ne ji di nav tenêtiyê de me
Kêfa min ji tenêbûn û

tenêtiyê re nayê
Xwedê ji we
JI Gulê, Temo û quling razî be
De Temo lawo, qu mg bîne, bide min û ez dest bi dûmahîka
destana Siyabend û Xecê bikim
Temo quling anî û li br Evdal berda
Quling hat
û xwe avêt hembêza Evdal
Hingê Evdal kem
- Qul1ngo, bextreşo, quling dîsan, ref bi ref, bi aliyê berriyê firine
Wext, wexta wan û zozanan e
Wey qulmgo, ma1xirabo, tu mayî
dîsan
bi şûn de
Ez kor im, çavên min nabînine û nikarim alîkarî li te bfkime
Per û baskên te şikestî ne
'De were, emji xwe re
bibêjin û bilorînin da
u çavên min vebine û tu bifirî û xwe btgihîrû bi refên hevalane
Civat 11 Evdal fireh dibû
Wî guhên xwe vekiribûn
li deng û pejnan guhdarî dikir
Çavên wi vekirî bûn
Serê wî dlltvî
destê wî yê rastê 11 ser pişta quling bû
Pêşiya wî şevereş
hundirê wi ronî û bi hêvî bû wi şevereşa xwe û ronahiya hundirê xwe kiribû yek û jê stran û meselên giranbiha derdixistin
Şagirtên wi, dengbêj ên din û xelk, bêdeng
11 dora wi civiyabûn û li benda gotina wî bûn
wi berê xwe da esmanan û bi hêdîka
dest bi, destana
Siyabend û Xecê kir

- Gelî guhdaran
bila tava royê û genniya
53
tîrêjên wê ji ser serê 'we kêm nebe
Gelî guhdaran
dinya ji evîndar û dilketiyan hez nake
Dinya jî mîna min kor e
Ava reş çavên min, kîn, rik û nefretê Jî çavên d
1nê kor kirine
Felek çerxa xwe ya xwar 11 ser serê dildaran dizivirîne û govenda xwe 11 dora wan digerîne
Xecê û Styaben,djî
herweki ku hûn dizanin
dilketî û evîndarên hevûdu bûn
Ev bun, çend, roj' ku ez her qala serpêhatî û serencamên wan dikim
Ev bûn çend sedsal ku dengbêj û stranvanên me behsa bextreşiya wan dikin
Belê
ew bextreş bûn û ketibûn ber xezeba dinya kambax
Hûn pê dizanin: wan xwe pir êşandin da ku xwe bigihînin hev
U' çaxa ew gihîştin hev, dinya li wan hate xezebê
Bi du derd, bela, keser
lec û şerên salan re
Siyamend û Xecê gihîştine hevûdu, Siyabend b1 destê xezala xwe Xecê gtrt, û ew danî ber xwe, se pişta hespê xwe yê navdar Deybilqtran û berê xwe da Sîpanê Xelatê
Wan riya du rojan, bt nîv :rojî birîn û xwe bi ç~yê gîhandin
Ew 11 serê çiyê
li ber kahn1yekê peya bûn, 11 wir konê xwe yê reş vegirtin
Kêf kêfa 'Wan bû
Derd û bela
kuştin û xwînrtjandln 11 pey mabûn, Her du evîndar di nav dar' û, bert, av û kahnî, teyr û xezalan de

bi tena serê xwe bfm
Li wir
li ser kahmyê
Siyabe d destê xwe bir stûyê Xecê û ew hembêz kir, ramûsaneke evînê jê stand
Hingê şik, guman, û xem, ji Xecê bi dûr ketin, tu xem di dilê wê de nema, Ewt ne xewn bû
Ramûsana Siya
bend ku wê hewqas lê xeyal dikir, niha bûbû rastiya wan Heta derengê şevêt wan, kêf û henek kmn û, paşê çaven xwe berdan xewa şêrin
Serê sibê
Xecê JI xew hişyar bû, ji kon derket û bala X\Ve dayê, panzdeh pezkûviji nav daran derketin û berê xwe dan kahmyê
Pezkûvî, yek biz:in bû,
yanzdeh nêrî bûn, Xecê! dît ku, nêriyekî kinik 'û, gulover û qelew, stirihên wî donzdeh şax jê diçin
11 her
54
dehên din dixist û ew ji ser bizinê vedigerandin
Hingê Xecê keniya û got, "eynî mîna Siyabendê min ê Silîvî
xwediyê tîr û kevanê zivin e
" Herçî Siyabend
bû, rebenê Xwedê
haya wî ji bayê felekê tune bû û hê di xewa
şêrîn de bû Bizin hate ser kahniyê, bi
çavan, 11 Xecê nihêrî û devê xwe xiste kahniyê
Nêriyê kinik û gulover li dora bizinê çû û hat û bi quloçan li wan deh nêrtyên din xist
Hingê Xecê keniya û kir ptrqîn, Bi ptrqtnlya Xecê re
Siyabend
ji xewa şêrîn çavê xwe vekir û ji kon derket û hate cem Xecê
Pezkûvî

ji wan bi qasî bîskekê bi dûr, diçêrin û av vedtxwartn, Nêriyê kinik lotik davêtin
Xecê bi destê SiY'abend girt 'û gotê
"Siyabende, ez bi qurbano
Il min Û
kena min megtre, ez ji muhebeta te têr nabim
bes, li van pezkûv1yan
bmthêre
Ew' donzdeh heb in, yek bizin
yanzdeh heb nêrî
Li wî yê kJnik Û gulover binihêre, stirihên wi bi donzdeh şaxî ne
Ew li 'wan deh nêriyên din dixîne, wan ji ser bizinê vedigerîne û xwe 11 bizinê digire
Ez kenîm, min got, ew eynî mîna Siyabendê
A Si lî' A diyê t
- k - _
1'1
~ '
VI
xwe
'
lT U
evane ZlV1n e
Hingê Sîyaben
d eciz bû û gotê, lt Xecê
pepûkê
ez evçend 11 dinya geriyame, mtn kesî fêm û pêlewan, wekî xwe
nediye Tu nêriyê pezkûvî bi mm dişibînî
Hay Iê, Xecê, hay lê
umrê pezkûv1yê
nêrî dê
îro
xelas be

Ew bikeve ku derî jî, ez ~ serê wî jêkim û wi bînim, tu ji me re bike şîv û xwarin
Hingê tu dê Siyabendê xwe
bi
çavên xwe t btbmî
tt 'Bi
vê gotinê, Siyabend çû hundirê kon
xwe şidand, rahişt ttr û kevanê zivîn
Xecê li cthê xwe sar bû, TIrsekê kete dilê wê
dest bi rica û emanê kir
tlS1y_
abend, ez qurbano, gotina min
ne b:i
xlrab- bû
Ez ketime bextê tet dev JI nêri berde
Ez dittrstm, B tenê şevekê em li cem hev mane, me hê
baş hevûdu nedtttye, Hesreta dtlê me hê daneketiye
Qed
a 11
55
m
i
n
nêrî keve, berde, btla ew di riya xwe d,e here
"
Lê S:iyabend li Xecê guhdarî nekir
li Deybilqiran siwar bû fl berê xwe da pezkuviyan
L spêda
çiyayê Sîpanê Xelatê nêçîr, rev û beza destan Û çîrokan dest 'pê kir, Siyabend lezand, ha li, vir
'ha li wir
xwe bi donzdeh pezkuviyan gîhand "" Nêçîrê 'nikaribû xwe ji nêçîrvanê yekta, 'bi dûr xista

Styabend bala xwe dayê ku ew nêriyê kinik û gulover, qiloçên wî bi donzdeh şaxî, 11 kêleka bizinê direvî
Siyabend
11 ser pişta hespê rewan
tîr û kevan hazir kir, berda nêrî, li kêleka rastê xist, di kêleka, çepê re derxist
Orinî bi pezkûvî ket
Hevalên wi revîn
ew di cihê xwe de gevfzî û 11 wir ma
Siyabend çû serê
ji hespê peya bû, li ser sekinî û lê nihêrî
Ma li dtnê kesekî mina Siyabend hebû, eger hebûya Jî
Siyabend ê dinê lê nekira ztndarrê
S
iyabend bi lingên
nêrî girtin û ew kişand bi serê Sîpanê Xelatê û gihand zinarekî bilind
W- kêr1ka X\\1e ji bêrika xwe derxist
serê wî je kir t xwîna wi rij and ser zinarê bilind
Siy'abend lingê xwe danî ser quloçê wi ku stûyê wî biqurfîne
Laşê nêri hê gelIll bû
Gava Siyabend dest avête stirih
ê WÎ
wî xwe dawşand, quloçê wi kete ranê Siy'abend û ew bi ser' serî, ji Stpanê Xe atê xist, Siyabend bi ser kema be alûkê û dara çeqemê ket û çeqem û kem 1 pişta w'
ketin û di sînga wî de derketin
Axîneke kûr ji, Siyabend rabû
got n
,ey, felekê tu çiqas li" ,~"""" xayin" "
11'"
, " , "~" "~~" , " ~ "' , ,~~~
,~
Herçî Xeca reben bÛ9 wê çavên xwe lt riya Siyabend digerand, dikir

'nedikir
Slyabe dê xwe
bi, çavan, nedidît
we zû daw û del1ngê xwe hilda
kete pey şopa pezkûvtyan û lezand, Ew çû ser serê S
pan!
Xelatê
laşê pezkûvî
li serê ç
1yê dit
Wê bala xwe dayê
nalîneke k" r Ji bine Sipan,ê' dertê
We' hema reşahtya Siyabend û çeqem û kem dtttn, Dilê Xecê hêja bû, lê bi kul û, keser û bi 'birin bû, wê dest, bt
56
u
qîrîn Û, giriyê kir Û hêstirên çavên xweşik bi ser hinarê rû ve barandin
Xecê bi qîrîn got, "ho lo
lo, lo
Siyabendo
ezbentyo, dinya ye
xweş dinya ye, bîhn Û htlma wê li, min û te tê, bi g lat e: di ser te re zinarekî bilind et di btn te re riya kerwanan et li kêleka rê ji ava Miradê û Firat e: Slyabendo
cihê min hazir btke, ez hat me ba te
" Siyabend, bi nalîn, lê vegerand
'hê, lê, lê, lê
mala bavê şewitiyê,
xwe bigihîne bi gundan; werisê heft gundan û biskê heft rindan li hevûdu bicivîne; tu bi destê nexweş û
birîndarê mala bavê xwe bigihine: Siyabendê Silîvî" fêm û, pelewanê dinyayê, ji 'hinê Sîpanê Xelatê
JI ser kem û çeqeman bi derîne

tt
Xecê lez kir
lezand, gihîşt war û gunda
kir qîrîn û ûgan wertsê heft gundan, tevî zilaman
bi xwe re anî Sîpanê Xelatê, Her kesekî, weris bi ser hev ve kir û bi Sîpanê Xelatê re berda, lê tu çare û îmkan nin bû
kesi nikaribû xwe bigihanda S
iya
bend
Bi vê terhê, bû êvar, herkest berê xwe da malê û Xecê bi tenê ma
Xelkê şîret 11 Xecê kirin û, gotin, "tu bi ya me bfkî, tu dê dev ji Siyabend berdî, tu çara wî nîn e
" Xecê
bi girîn, 11 wan vegerand, "na, nabe, Rebbê jorîn şahidê min e, dilê min bi Siyabend re ye
Tiştê ku hatiye serê min
bila neyê serê kesî
Dev
Ji min berdin
It
Piştî çûyina xelkê, Xecê li kêleka zinarê xopan rûnişt û bang Il Siyabend" kir, "ho, ho, h09 lo
Siya,benda, quloçên pezkûvî pir biçûk in, Siyabendê min berdaye bin Sîpanê Xelatê, ser kema belalûkê, Tev' bi rehma Xwedê bû '
JI gunehên evd û însanan, bû
ji hev qetand1ye destê zava "' 'bûkê 11' Siyabend
ji
Jêrê
bi nalîn
lê vegerand
"hê, hê
hê, Xeca minê
lê

lê
quloçên pezkûvî pir mezin int Siyabendê te berdaye ser dara çeqemê, binê zinarê
Her
çawan min ji, hev qetandiye deste nêrî û bizinê
wi
57
w1sanjl hev qetandtye destê mêr û jmê
" 'Hingê Xecê got
"lo, lo, Styabendo
lo
lo
mala bavê şewttiyo, pezkûvlyo, pişthêştno Slyahende min dtxaptno, Il ser zinar û, çiyan, wî digertno
bi ser
kema belalûkê ve dixîno
felekê ev çi tofan e, bi serê me de aniyo, destê bûk û zavê ji hev diqetmo
"
Halê Siyabend ne tu hal bû, hêdt hêdî, ruh j:i canê wi derdiket
wi bi xîreta dawîn jt Xecê xwest ku Xecê: dev jê berde û here ji xwe re mêrekî bibîne
"carina navê Siyabe'ndê, xwe yê Silîvî bi bîr btne, Xecê,
ez, ketJme bextê tel tu xwe bernedî
dinya rom ye
ruh şêrin, e
fl Xec! bersîv dayê
"ho, lo
lat Siya,
benda
rûgeşo, Ez zînê hespê Deybûqiran li serê naşidînim; ez enê te 11 xwe nakim û xwe naxe

, mtltntm: ez li Deybtlqtran siwar nabim û naxerînim, ez xwe bi bajaran nagihînim: ez çavê xwe 11 xortan riagerîntm: ez tu dilan b ser dilê te re nahebtntm
i
Ez Xecê me, Xeca dtn im; ez, va ye, destmala xwe ji bêrîka xwe derttntm: ez ê li se çavên xwe yên xweşreşan û 1 ser hinarê ruyê xwe bişidtntm: ez ê, vê gavê
destê xwe jî bi destê Slyabendê X\Ve bigihînim
tl Bi dû gotina xwe re, Xecê bi
destmalê çavên xwe girêdan û xwe JI serê Sîpanê Xelatê berda
bi sei dara çeqemê de ket, dar şikand
tevî Siyabend9 gêrîjêr, bin newalê bûn, Ruh di canê Siyabend de nema 'û ew' mir
Xecê hê dijiya
Piştî demekê kerwanekt dirêj di bihurê re
derbas bû
Yeki ji rêberên kerwan dit ku zilamek û keçek 1 erdê bûn
Ke rwa n tev 11 hev civiyan
li ser : aşên wan sekinin
Xecê hê dinalî
Wanjê pirsîn ka çi qewtmîbû Xecê bi dengeki zîzli wan vegerand û got
"Oelt xortan, ez ketime bextê we û Rebbe jorîn, kes pirs û suwalan ji min mekin, Hûn xêrê ji çav 0
destên xwe bibin1n, eger hûn dixwazin xêrê bikin, hûn ê gora min û vî zO am ê
i tenişta hev bikolin
Ez
58
ê jî ruha bimirim Û 11 vê dinyayê namînim
Hûn ê navê me li ser kevirê gora me binivîsin
Navê min Xeca Resûl et navê vî çelengê ji Siyabendê Silîvî ye
Hûn ê tasekê bînin, ztncir btkm, serê zincîrê bavêjine gorê
tasê daynine ser devê kahntyê, li dora me darên spîndaran biçînin

Gava kesên xwedixêr hatin
bila ew avê bi wê tasê 11 qurmê darê bikin
Hûn ê 11 ser tirba me weha binivîsin
ff
Gava Xecê xeberdana xwe xilas kir
ruhê Xecê j'1 canê, wê bi dûr ket
Serokê kerwan rabû û got, "ez li vê xêra hanê qestdtme, ez ê bi gotina vê keçika mehrûm blkime
" Ew rabûn, gora Siyabend û Xecê kolan, navê wan li, ser ttrbê neqtşandtn, darên spîndaran 11 dora gorê çandin, tasek anîn, zincîrek pê ve kirin, serê zincîrê bi serê kevirê gorê xistin û tas li ser kahniyê danîn
Ez bi xêr
hûn bi silamet, Gotina min, çû deştê,
De û bavê hazir û guhdaran çûn bihuştê
Xwendevanên, eztz, bi vt awayî, Evdal serpêhatiya Siyab,end û Xecê dawî anî
Herweki hûn pê dizanin, gotina devkî û gotina nivîskî bi hev namînin
Gotina devkî jîn e, gotina niviskî siya
jinê ye
Ew gotinên ku ji devê Evdal derketin û me li jorê nivisîn
bi tenê kurtebirekî biçûk ê wî danê êvarê ye:
Ji ber ku, gava Evdal destana dildaran digot
ew pê re diçû
wi bi awayekî welê digot ku şagirtê wî û guhdar li rojên Siyabend û Xecê vedigerîn û dibûn heval û hogirên wan
siûda, evîndaran dilê wan vedigirt, ew z,îz û, kelgirî d:ikirin
Evdal serpêhatiya Xecê 'û, Siyabend bi gotin got, Lê
wi xeberdanên Xecê û, Siyabend bi stran guhezandtn guh-
daran Ew, pir caran
disekinî
bîhna xwe dida" li
59
dengên dora xwe guhdarî dikir û paşê dom dikir

BI hezaran dengbêj û, stranvan destana Xecê 'û Siyabend gotibûn û, dlgotm
Lê tu kes nedlgfhtşte katê Evdal
Stran
serpêhatî, destan
bi alîkariya Evdal, dibûn perçeyekî jiyana xelkê
Evdal, pir caran, ji Şagirtên xwe re digot,
- Şagirtino~ rûgeştno, bi xwe bawer, bi zimanê xwe şêrin
b dengê xwe xweş; bi gotina xwe fesîh û sivik bin
Hunermendî: daxwaz 9 coş, sebir
înad
xebat
nermî Û ziravb1histlyari ye
Bila çar tişt j1 we
I-ê 'bin j- - - i rdî rdi _
a -
AJ, m ne ',' n: m 'U crwanmei 1, comei m u xerxwazi
Bila çar tişt Ji we b dûr bin; qels- û namerdi, çik
osî û x1rabixwazi
Ev her çar tişt, J îrî, ctwanmerdt, comerdî û xêrxwazî dê alîkarî 11 hunermendiya we bike
Gava hûn bi xwe û 'bi gotina xwe ne bawer in
mebêj tn, Li serê btxebttm, lê hûr bin da ku hûn pê bawer dibin
Gava gotin û stran we nah ej 'îne
kela, dilê we h1lnade û bi germî ruhê we venagtre
hingê hûn wê gotin û stranê mebêjin
Wê çaxê kêmaniyek heye
lê bifikirin
U ji bîr mekin, hûn blJarteyên xelkê ne
Hûn ji, xelkê werdigirin 'û didinê
Jê bi dûr mekevin, rê medin ku ew ji we bi dûr keve
Jîn û hunermendiya Evdal jî li gora gotinên wî bÛ,IL Ji, lewre, ew bûbû dengê xelkê

Ptştf ku Evdal serpêhatiya Xecê û Siyabend bi dawî arû
şagirt û guhdar j'i
bi qasî çendekê, bêdeng man
Ji kesî deng dernediket
Ew çûbûn wext û dewranên S1yabe:n'd û Xecê
Bi tenê quling xwe dllvand û, dikire qîreqîr
Qîreq
îra quling ne Ji bêdengiya doraliya
Evdal bû, le ji bo dengên ku ji
jor
ji esmên dihatin
Ro diçû ava
Hawirdor ketibû nav' rengekî sor
Erd
esman, çiya bi rengekî sor di~ btrtqîn
Ro di kêleka çiyê re diçû ava û ji haziran, û civata Sipanê xe atê xatir dixwest
Li esmên jt, teyr û ttlûr, ref bi ref, difirin û dixwendin
Qîreqîra
60
quling ji bo vê yekê bû
Ew 11 serê erdê, hevalên wî di nav ewr û esmanan de bun
Evdal westiyabû, bêdeng, serê xwe dizivirand û
dipojinî
Gulê qulmg]t hembêza Evdal wergirt
Hejmara guhdaran gihîştibû sedan
Ew hemû bêdeng rûniştibûn û li dengbêj ê ku nikaribû bi çavan wan bibtne, dinihêrîn
Dengê dengbêjê dilronî dilê wan vegirtibû û ew biribûn kûrahiya destan û
serpêhatiyan
Weki ku Evdal îlmê sihêrê li serê wan xwendibû
Evdal

11 wê derê
di nav kirasên xwe
yên spî de, bi xwe bûbû lehengê efsane û destanan
Lehengekî zirav, dirêj
rûgeş
~ çavvekirî
Meriv
digot qey
ew ji dewr
dewran û sedsalên kevnare hatibû
Paşê
hêdî hêdî, civata Evdal belav bû
her yek bi
derekî de çû
Edî êvar dibû
xe k ber bi konên xwe diçûn
Evdal
Gulê
Temo, quling û çend dost û şagirtên Evdal
bi qas- bîskeki din jî
li bin daran man
Serpêhatlya Siyabend û Xecê Meyro û Bengîn
bi xurtî
bi bîra Evdal anîbû
Evdal, bêdeng, dlpojilÛ
Bi me welê tê j:ixwe sedema wê bêdengiya
boş ku pişti xelasbûna destana Siyabend Xecê di nav şagirtên Evdal û xelkê de hate pê
disan
ji ber Meyro û Bengîn bû
Siûda Xecê û Siyabend heşê guhdaran biribû ser hal û hewalê Meyro û Bengîn
Kesî nizanîbû ka Çi bi serê wan de hatiye û ew ber ku de çûne,

Meyro û Bengtn ki bûn û çi bi wan qew1m
îbû?
Em êt hêdî hêdî
bên ser wan ji
Lê niha, jêre hê wext heye
Dinya hinekî çiksayî bûbû
Gulê hate û kulavekî
şivanan avête ser milê Evdal û taseke dew dayê
Gava Evdal weha destan OA stranên dirêj digotin
Gulê Jê re dew çêdikir û carina taseke dew didayê
Evdal
bêdeng
tasa dew wergirt Û ew vexwar
61
rlTêj ên, roya ku diçû ava
11 'rûyê Evdal dixist û rengê ruyê wî 'yê spî dtqulipand rengê sor
Li spêda Sîpanê Xelatê govenda rengan bû,
Evdal rabû ser' xwe, gopalê xwe girte destê xwe, kirasê xwe dawşand û
çend gav ber bi pêş çû, li wir, li pêşiya xwe
It asoya fireh û reng- fekir, -bêyî ku tu tiştî bibîne
Hingê wî devê xwe vekir û, bi keser got
- Xwedayo, tu li gunehê Bengîn Tavbanûyê mêze bikî
t wan JI siûda Siyabend
Xecê star bikî
Ew xort û evîndar in
gulê
nûbtşkovt ne, haya wan JI xtrabî û kirêtiyan tune
wan nekî pariyê xirab û ktrêtan
Hingê Gulê xwe gîhand cem Evdallljê re got,
- Evdalo
mehrûmo, dîwar JI nemê dfkevtn, meriv JI xemê dikevin
Xem mexwe, roj bixêr, xeber pîroz e
Binihêre, ev du hevalên meji riya dûr

aliyê çiyayê Şengalê hatine
Sado
Biro
Berî niha hi çend saetan
ew hatin
lê me nexwest ku te gotina xwe btbtrtya
Xebera wan pîroz e, ew dibêjin, rêber 'û qilaw1zan şopa Meyro û Bengîn h anîne û dane pey şopê Vê êvarê
îşev, sibê, hema çi bigire
dt nav avaçûn û, htlavêttna 'tavê de, ew ê xebereke btg1hinin me
Rêber, qllawtz
xort, dengbêj, gundî û şervan 11 rê ne
Ew derin û 'tên û her tiştî bi me digihtnm
De were, tu hinekî 'bîhna xwe bidet, hinekî rakeve
Ev bûn çend roj ku qet xew neketiye çavê te
- Gulê, mehrûmê, zimanxweşê
tu xweş dibêjî, lê dilê şikestî nacebtre
Şevereşa min, derdê Bengîn Tavbanûyê bûne kul û ketlne dilê min
Ma ez rebenê Xwedê çi bikim?
Eger dinya weha 11 ber min reş ebûya eger mîrê min Tahar Xanê mêrxas û qedirbilind niha b
ijiya û em
xe kê 'VÎ welatê neçar weha peregende nebûna
ma halê me dê ev hal bûya? Ma
62
ez çi bikim? Yekbûn gir û çiyan dixîne
lê, ew ji tune
; Ma ji destê feqtrekt belengaze mina min çi tê? Li milekî derd 'û kulên me, '1 milekî ji, bêgaviya
me
Em ê niha Evdal~ Gulê û yên mayî li serê Sîpanê Xelatê bihêlin û vegerin se wan rojên ku dinya, hêdi hêdî li ber Evdal bû zindaneke reş û dinya wî JI ronahiyê qullpi reşahiya şevan

63
64
2
Pêveçûna Evdal û Gulê bi Şêz Sllê re
Dinya çerx û felek û dolab û dewran e
Bayê felekê ji wir de tê, di vir re diqulipe
Iro şahî û şênahî, sibê nalîn û şîn e
Dinya, dinyeke kambax et namîne ji tu siltan
hakîm, beg û mîran re
Rind zû derin, xirab singê xwe dadiçikînin meydan a dinê û dimtnme
Tahar Xan hebû, kalemêrekî 'rind, yek ji mîrekên kurdan
bavê feqîr û ûqaran
dostê alîm û
zaneyan, xwediyê heq
hiqûq, eda et, edet û toreyan
Erdê Tahat Xanê fireh û têrzad, hikmê \VÎ: nerm
û adilane bû
Heta bi deriyê tixûbê welatê :Ecemê
bt deriyê tixûbê welatê çiyayên Qafqasê, deriyê mtrekanên Kurd Bêdlis û
Heqarê hemû 11 ber hukmê, 'wî bû
Koşk û qonaxên wi 'mezin; avahiyên
wî xweşlihevhatî
meclîsa wi her tim geş bû
Rûyê wî bi ken
gotina, wî XU1eş, riha wî dtrê] û spî, sim bê ê wî badayî bû Şeş jin
bihîst û yek zarok
heft law, çardeh keç]
û bi qasî çil xulam
qe rwa ş, - carlyên wi hebûn
Gava ew derdiket seyd û nêçîrê, geşt û seyranê, sê sed fêm
leheng û efwanmêr jî pê re diçûn
Dosttya wî dostî
qewlê wî qewl bû

Sifra
65
'WÎ haztr, meclîsa wî şên
kitabxana 'wî dewlemend bû
U Evdalê zeynikê dengbêjê mîrekî weha bû
'Welatê kurdan, mîna her gavî, hingê ji
perçe û peregende bû, Welatê bêmal, bêkemal û bêdewlet di bin nîrên huktmdartyên Ecem 'û, Osmaniyan de bû
Wan welat ji hev xistibû û 'her perçeyek dabûn mîrekî kurd û hemû mîrekanên kurd bi xwe ve gtrêdabûn
Herçî Osmanî bûn, 'wan welatê kurdan kiribûn warê lec û şeran û mtrekanê kurd ji kiribûn şervanên xwe û, berdevkê Ali Osmanî
Gava Osmanî diçûn sefer 11 talanên welatê din
wan haziriyên xwe li welatên kurdan dikirin
kurd ji bi çek dikirin û ew bi xwe re dibirin
Gava xelk û dewletên din davêtin ser Osmaniyan
Osmanî :ew dikişandin welatê kurdan û 1 wir
ew vedigevtzandin
Ji ber ku welat asê
xelk şerker
iklim 11 wir çetin bû
Kurdan digotin, "mêr dimire nav dimîne
ga dimire çerm dtmtne" û xwe davêtin nav agirên lec û şeran Welatê bêptşt û bêxwedî bibû kavil û xtrbe
Hatin û dewlemendiyên welêt ved:lguhezîn Stembolê, payttextê dewleta Ali Osmani
diketin nav sanduqên zêr 'û yaqûtan en saraya Osmanî 'u neçarî û belengazi dtbû para kurdan
Osmaniyan pişta kurdan mist didan û wan, mtna "egîd, fênze - canfedayên dewlet û xelkên b nav dikirin, lê deriyê nim
îrfan, zanîn û dewlemendiyê li ser wan digirtin û nedihiştin kurd
bfbtne yek û rû JI nezant û neçariyê badin
Tahar xan

mîrê rîspî
bi vê yekê dizanîbû
wi
dewr ,Mi dewra dîttbû û bi caran rûbarî dek ti dolabên Osmaniyan hatibû ,Zanin û tecrube baban rêberê wi
Lê wekî herkesî, ew î ditirsî û bir û baweriyên xwe 11 her civat û mee 'is-nedigot
Ji ber ku derdê wi ne bi tenê osmanî û zordariya wan bû, her
66
weha pismam Û btrarzî jî lê ne durist bûn
Daxwaza, kambax a hukimkirinê 'û mal û milkên dinê rû li pismam û b1rarziyan reş ktrfbû, ew ji rê derxistibûn û kiribûn dûvik
berdevk û 'peyayên, OSl11an1yan
Destiyê bivir ji darê bû û pê' dam qehîm û kal dibirî
Ji lewre, Tahar Xan
bi tenê, Ji dostên xwe yên pir nêzîk, aqilmend, zana û dengbêj ê xwe 're deriyê
dilê xwe vedikir û bir û bawerî, şik û guman û daxwaz û hesreta xwe digot, - DJJminê bav û kalan nabin dostên me kurdan, wi digot
Nanê Osmaniyan li ser çoka wan e'
meriv nikare li wan bawer be, çiya dikare here ser çiya
lê xûyê Osmaniyan jê nabe c
da
Dost1yeke durû, siyaseteke' fetbaz û awireki zordar XÛyê wan e~ Lê kevir û kuç ên Xwedê jî li serê me kurdan bartne, Em kurd
jthevketî, bêser û bêber In
Neza
û cahîhyê em dîl
girtine
şerê birakujî û ezbenitlyê em kirine xezan û, belengazên pêncperan, Em kurd 11 hev hatine xezebê; blrarzî li apan
xwarzî li xalan, bira, li
biran

cîran 11 cîran
v
Gotina Tahar' Xanê weha bû, ê Ji destên wi Jî çi dihat 'wi texsîr nedikir; alîm, zana 'û hunermend 11 dora, xwe dicivand û qedr û qîmet dida wan; hal û hewalên beg 'û mîrên din ên kurdan dipirsî û gava qise dihat ser qtsê, g11- û gazincên xwe ji wan re digot; bi rindî, nermî Û edalet hukim 11 xelkê xwe dikir: wîjdan
serbestî û însaniyetê ji kesên nemusltm, cthû, ermen, suryan, keldan, êzîdiyan kêm nedikir
'U li aliyê eskerî j~
wi xwe bi quwet dikir
U dengbêjê WÎ Evdalê Zeynikê ji dibû şahîdê vi hal û hewalî, Evdal ji, meclîsa Tahar xanê kêm nedibû û tim pe re bû Evdal 'pê re xwartn dixwar, pê re radibû û rûdinişt, pê re diçû sefer û ziyaretan
'pê
67
re derdiket havîngeh Û zozanan
Evdal hosteyê ştxulê xwe bû
Di meclisa şên ~ geş
şevên çile yên dirêj û rojên havînê yên germ det wî destê xwe datanî ber guhê xwe û, ji Tahar Xanê re distra
Ez Evdale Zeynikê me
Şahîrê dinê
Şalûrê erdê me,
Ez dengbêjê Tahar Xanê kurdi me
Ez b'UbUê ber perê 'rojê,
Mtrekî çê
siwarê hespê Gogerçinê, Aşiqê pelê Gulê 'me
Di wan rojan de k ' Tahar Xan he li ser xwe bû û dinya li ber çavê Evdal pak û ronî bû, rojekê ji rojên Xwedê, gava Tahar xan û civata "wi Ji konaxa ku li ser donzde 1ngan avakirî û bi mermerê spî ferşayî bû, bi dernediketin û li derve flzîna bayê, gurîna birûskê û xuşîna barane bû
hingê xeberek gihişt qonaxê: kerwanek ji riyên dû'r hatibû û xwe

gîhandfbû bajarê Tahar Xanê, Roj
rojên ztvtstanê
bûn
Dinya aram" hawirdor tarî" hatin û çûyin kêm bû
Dt rojên weha de, sebir û şênahiya civatê dengê Evdal, tembûr 'û bilûra 'WÎ b'Q
wi qest 11 ûztna bayê, gurîna birûskê û xuşîna baranê dikir
bi kel û coş dengê xwe bilind dikir
Gava e'w diwesti, jina wi Gulê
keça keşîşê bajarê Xamûrê, diya Temo, dengbêja dengxweş dJhate hawara wî
, dikire deng û dida, alanê
Hay lê, yemanê, 'elekê yemanê, lê bê emanê
Felekê
guhdar
xwe devanên delal, felekê di wan rOjan de kumê XW~ li ser Evda xwar kir tl ew Ji ronahlya çavan, spehîU
xweşiya dinê bêpar kir
Gava xebera gihiştina kerwan hate qonaxê
Evdal bi sermayê ket bû
Taya nexweşiyê ew bêhal
68
xistibû
Dengê wî ketî, devê wî qerimî bû
Nexweşiya wî gerçî sivik bû, lê jê re bîhnvedan û razan diviya
Eger wî hinekî 11 xwe binihêrta
guh neda der û dora xwe, ew ê, dtsan, bi qesta ba, birûsk û baranê rabûya
Lê lîstlkên bêxêr her gav dijminê daxwazên bixêr in
Kerwan hatibû û li xanekî bajêr bi cîh bûbû
Baranê bernedida ku ew bi riya xwe de herin
Ew 11 xanê asê mabûn
Piştî çendekê

xebereke nû gihîşt qonaxa Tahar Xanê: dengbêjekî yeman jî bi 'kerwanê re bû
Û
niha wi qest li
ba
baran û birûskê kiribû
Navê wî Şêx Silê, dengê wi gur, awaza wî nerm, awirê wi xurt, stranên wi kemilî bûn,
Tahar Xan xeber şandê 'ku ew were qonaxê
Evarê, gava Tahar Xan meclîsa xwe gerand, Şêx Silê hat Şêx Silê merivekî kin û j ar, feqîr û neçar bû
Ew ne dengbêjê beg û mîran, dengbêjê rêvlnge û kerwanan bû
Şêx Silê hate meclîsê, silav 11 Tahar Xanê û meclîsê kir û bêdeng, li ber devê deri rûnişt
Wext
wexta şîvê
sifra giran bû
Evdal jî, li jor, li kêleka Tahar Xanê rûniştibû
Tahar Xan deng li şêx Silê kir û gotê,
- Mêvanê ezîz, silava te li ser seran 'Û ser çavan e
Cîhê dengbêj û hunermendan ne li nav sol û pêlavan et de fermo were kêleka min
nav dost û he-
valan e
Şêx Silê rabû, çû û li kêleka Tahar Xanê rûnişt
Niha Evdal li milekî, Şêx SUê lt mUeki rûniştibûn
Wan bi hev re, şiva êvarê
goştê pez û berxan xwarin Bi dii xwarinê re, wan xwe dawşand1n û qahwa xwe vexwartn û dest b qise û axaftinê kirin
Meclîsa Tahar Xanê şên bû
Gelek axa
beg
giregir

alim
zane û dengbêj û stranvanên kurdan li wir
bûn Gerçi axaftin û xeberê dest pê kirib A , lê kesên
hazir 11 benda gotin û stranê bûn
Zima ê xelkê
69
bêhestt bû Û 'wan weha digotin
- Bavo
li gora gotinan, ev Şêx Silê ji ne kêmî Evdalê Zeynikê ye
Pi
şti ku meclis gel fll bû û meram û miraz hatin meydanê" Tahar Xanê deng 11 Şêx Sllê kir,
- Mêvanê delal, me bihîsttye ku tu merivekî çê û dengbêjekî baş î
Çtka tu dengekî derkeve ûji me re çend stranan bibêje
Şêx Silê jî, jixwe, li benda qisê Tahar Xanê bû, wi nav û dengê Evdalê Zeynikê pir bihîstibû
Niha ew hatibû û li kêleka, Evdal :rûnişttbû Û fersend ketibû destai ku xwe û hunermendiya xwe nîşa nt hazir û guhdaran bide
Ew carekê-du caran ktxuya, li dora xwe nihê ,
û hêdî hêdî est bi stranê kir
U der rebma baranê ye,
U hundir tehma Tahar Xanê kurdan e
Deşt û zozanên Tahar Xanê di nav berf û pûkê de
ne, Ez rebenê Xwedê
Şêx Silê zimanxweş hatime ser
sifra mezin
meclisa girane
Bi vî awayî, bi pesn û qedtrgtrttn, bi rêz û rêzdarî, Şêx Silê bi qasî derengê şevê xweş kir Û stran gotin
Derengê şevê
meclts belav bû 11 herkes, yeko yeko, dudo dudo
derketin û çûn
Çend mêvanên Tahar Xanê hebû

wî Şêx Silê jî mêvan kir û berneda ku ew vegeriya xanê
cem hevalên
xwe~
Dotira rojê qise
xeber û gotin
b leza baran 0
birûskê, di nav bajêr de belav bûn
xelkê digot
- Bavo, Evdal hew dikare bibêje
Ew nexweş û kal e
Ev Şêx Silê dengbêjeki xweş
b dilê we ye
Evdal xwe li nexweşiya giran datine ku li hember Şêx Silê ranebe
70
Hûn dibînin
xirabî weha nefesê 11 rindiyê dlçikîne û tiştên kirêt li hev tîne
Ev qise û laqirdî çûn guhê Evdal, Evdal bû agirê pizot û kete meydanê
wî hêkên xav vexwarin, şîr germ kir
rûn kiriyê û ew daqultand, qirika xwe girêda
cil û kulavên germ avêtine ser milên xwe
dengê xwe terbiye ktr û ma li benda êvarê
Evarê meclîs, disan
hate girêdan
Icar cîh tune bû ku 'meriv lê rûne
Mee Isa fireh 'û dirêj
tij- bûbû
'Hinan bihîstibûn ku Evdal ê J- wê şevê bigota
lê piraniya haztran]t bo dengê Şêx S ê hatibûn
Gulê 11 Temo Jî dabûn dû Evdal1i hatibûn Gulê nedixwest ku Evdal rah1şta stranan û bigota
Lê Evda 11 kesi guhdarî nedikir
Ew dengbêjê welêt
şalûlê erd û esmanan bû

TU kes bi ser wî, re nîn bû
B dû xwarm 'vexwarin û xweşsohbetê re
meclîsê haztrtya xwe û stran
gotin
ders û tecrubên wê şevê kir
Evdal
jtxwe, hazir b ~
wi cihê xwe rast kir, tembûra xwe xist destê xwe û ji
Tahar Xanê xwest ku ew rê bldiyê da ku dest pê bike
Ev yeka ne bi dilê Tahar Xanê bû
- Evdalo
dengbêjê min ê yektayo, tu nesax it dengê te ketiye û bi dtkuxî, De berde, bila mêvanê me
îşev jî
xweş bike
1 û birînan bikewîne
bi mexseda stranê, ders,
tecruban bi meclîsê btgu heztne,
- Mîrê mino t Tahar Xanê dilpak, ez dengbêjê te
şalûrê 'erdê
şahtrê dinê, bilbilê ber perê rojê mea Ma
di şeveke weha de
ez deng û awaza xwe bi esmanan negihin1m û zora dengê baranê nebim hingê d,engbêj1ya mtn 11 kû ma ye?
- Tu dizanî, Evdalê dengxweş
Hingê bila Gulê Jî carina bê alîkariya te û gotina te bi gotina xwe rengîn bike De baş e, hûn her sê dengbêjên navdar
Evdal
Şêx Slle û Gula bi nav û deng, bi tenê
bi
71,
kilam Û stranan bikine ceng
Em e şevbfh urkê xweş bikin û 11 we dengbêjan guhdarî bikin

Bi
ser gotina Tahar Xanê re, Evdal dest pê kir,
xweş e
şev xweş e
U der baran et lt meclisa Tahar Xanê, dUê min
bi kel Û
coş et Ev bûye çend rQJ Û şev, ez diqûim
naqirtm; Sewta min det nayê,denge min ketiye,
Icar gotin e
xweş go
tin e
de, rnanê deng û bedena mbl e,
De fer mo Ş:êJC SHê, mêvanê pak e, gotina ~e bibêje
Bi strana xwe rabe
Bi vê gottna Evdal
11 wê derê
pêveçûneke welê dest pê kir ku ne îşê aq an bû
Ew ec û pêveçûn bû efsane
~ çîrok * ket devê dengbêj û stranvanan
Di tarîxa welatê kurdan de
pêveçe neke welê nehatibû
ditin
Du dengbêj û h nermendê hoste ku tecrube, zanin û dîttnên salan li pey wan bûn, rabûbûn hev
Lec, mîna lecê du teyrên sim1r
yan du dtrendeyên
wekî, şêr û pilingan
yan jî du lehengên efsanewî
bû
Guhdarên xwedtsebtr, mixabin, gotinên me yên xav 'bi têra sallxdana wî lecî nakin, lê lec bi dilê hazir Û
guhdaran bû
Evdal weha digot,

şev el xweş şev e
Çem û ka1utî bi ser me de tên xuşexuş e, Al
iyekî
me Rom e
y
ek Uris e
yek Ecenl e
Dengê m
in baûr et zimanê min qe'lem et
Heval û dostên min
aşiq û
dengbÇJm vê d:lnê ne, Ez ê îşev bibêjime, weUe bibêjime
Heta kurê kuranft rabe, vê şevê bi bîr bine
72
Şêx
Stlê jt, pêşî
bi bilûrê deng dida Evdal û paşe, hi, gotmê, bersiv didayê,
Lo ,yeman
lo hoste û qedirgiran" Rast el gotina te ue,
şev e, xweş şeu e
, baran e dibare, xuşe xuş et
Gelî hazir 'û guhdaran
Ji bo navê Rebê Alemê
şahid bibine, Evdal e
dengbêjekî navdar e,
Rihana ber devê geliyan e, di wexta xwe de heŞÎTl dike, şax davêje, Niha kalekî ,bi ço û gopalan et sewta wî dernayê, deng'ê wî ketiye, Hûnjê re bibi:Jin, de bila ew xwe bide aliyan et
Wê şevê heta destê sibê, her du dengbêtan stran û kilam gotin
Gotinên wan mîna dilopên avê li pey hev dihatin
Mixabin
me îmkan û ew hunermendî tune ku em niha wan dilopên zelal bireşînin ser van kaxizan

Lê be ê, guhdar bi
seriyekî mest il bi dileki bi best Ji meclisê derketin
Gulê wê şevê deve xwe venekir û stran 'negotin
Ji ber ku Evdal bi têra xwe bû,
Herçî Evdal bû, ji taqetê ketibû", heşe wî diçû û dinya li ber çavên wi bi mij û dûman bûbû, Evdal
Gulê, Temo û çend dostên xwe şandin ser hekîm û xocan da ku ew jê re dennaneki peyda bikin û dengê Evdal pê vekin û ew dengê mîna lehtyekî: boş, dîsan" here û xwe bigihîne keç û bûkên bajarên Stembol~ Baxda, Tehran û Şamê
Gulê û hevalan xwe ltvandin, lezandin 'û dermanme bi Evdal gihandin,
Evdal ew li pey hev vexwarin û di ser det hêkên xav
şîrê germ ti hingiva şêrîn vexwarin
Dotira rOJêt dane êvarê, meclisa Tahar Xanê dîsan geriya, we rojê kesi sebir nekir ku heta êvarê
73
btpa
Deriyên qesrê vebûn
mêvanên Taha'r Xanê û xelk herikîn hundir
Xebera lecê dengbêjan 11 bajêr belav' 'bûbû
Hewşa qesrê jî bi xelkê tijî bûbû, Xelke kulav û cil avêtibûn ser serê xwe da ku xwe ji baranê star bikin û dengê dengbêj an seh bikin
Bi dû gotinên Tahar Xanê re, Evdal û Şêx Silê
11 hember hevûdu
cîhê xwe xweş ktrm
Gulê û Temo Jî 11 kêleka Evdal bûn
Evdal
bi gotin, dest pê kir
- Mîrê min
gelî hazir û guhdaran, diwan e, xweş diwan e
Diwan" dîwana Mîrê me Tabar xan e
Em ê bibêjin bi izin A destûr
heta em digihijine derecê kûr,

şêx Silê
bi gotin" lê vegerand
- Rast et gotina te ye
Xweş e, dîwana Mîr Tahar Xanê xweş e
Ez natirsim ji dengê baranê
j'1 ewrê reşe
Le ez dibînim, halê te ne tu hal e
nexweşî li ber q' rik ,'" gewrtyan e
Ez ji riya dûr: hatime vira, meclisa Tahar Xan e
Xwezî hinekî jî Gulê, diya, Temo
dengbêja delal, dest pê bikira
bi min re bistlra
Gotln~ Şêx Sflê ne bi dilê Evdal bû,
Şêx Sllê
heşê xwe berhevî serê xwe ke
Ez
dengbêjê xelkê, dengê welatê me
Ez ji taqetê neketime, li
her çar aliyê dinê gertyame
Min rewşa dinê
bûyerên dewr û dewranê kirine ktlam e stranme, Gulê 11 vir et li ba min e
Gava hewce be
ew ê xwe b me bigihine
Tu, were, 'bala, xwe li min 'vegerîne û bibîne ka dengê min çawan deriyê kahn1ya kilam û stranan vedike
Lê be êt gotina Evda1ji ne bi dflê Gulê bû
- Evdalo
malavayo, zarşêrîno,
ma tu rnzanî, ez
Gul Im
Gula dengbêj im Ez li, ber 'tu kesî xwe nahevtmm

Ez çoka xwe didime çoka mêran 'û kJlam û stranan davêjim mîna şe û pilingan
Bi dû vê gotlnê re, ew Il Şêx Silê vegeriya û gotina
74
xwe domand
- Şêx Silê
ez Gulê me, ji jin û xatûnan hîn zêde
me
Navê min Gulê ye
lê t
ji xwe re bibîne tevdîr û Têye
Ez ê vî danê êvarê stranan bavêj1me ser teye
Ez Gulê me
gula Xamûrê me
kewaniya Evdalê lawê zeynê me
diya Temo, dengbêjê dîwanan
serkara
Jinên, welatê me
Bi vî awayi, Gulê jî kete nav lec û şerê dengbêjan
Em gotinê dirêj nekin, pêveçûna dengbêjan du ro û du şevên din jî dewam kir
Tahar
Xan
mêvanên wî, haz r û guhdar ji cîhê xwe nelivîn Xwartn 'û vexwarin hatin û çûn, Li derve, xelk û şênî 11 hev civiya'
hejmara wan gihîşte bi sedan
Hewş
bexçe û ber dîwarên qonaxê tiji bû bi
merivan
Baran nesekmt, ji bervaj iyê , wê tewr şidand
Tiştekî dê biqewimiya
Herkes li bendê bû
Lê çi?

Ew tiştê kt herkes 11 bendê bii
qewimî; ava reş bi çavên Ev,dal de hat, Dengbêjî hunermendî ye
Hunermendi jî ked
taqet û quwet e
Pişti pêveçûna çar rojan
Evdalê reben û nexweş, bi temamî, ji taqet û
quwetê ket
Dinya 11 ber çavên wî reş bÛ9 meclis bû zîndan, çirûskên agirê tifikê bûn, xalên tarî, Evdal di nav 'valahiyeke tarî de winda bû
Ew kete binê bîreke kûr û bêbinî
Çavên wî vekirî man, lê rona-
hiya çavan jê vekişî
Ew wexta ku koranî
bi ser Evdal de hat, dor, dora wî û gotina stranê bû
Ji nişkekê ve
wî dengê xwe biri û bi hêdîka 11 dora xwe nihêrî
Lê wî tu tişt nedît
Meclîs jî kete nav bêdengiyekê
Evdal çend car dest tl, tiliyên xwe 11 ber çavên, xwe birin û anîn
Lê ji perda reşahiyê pê vet wî tu uşt nedît
Hingê wî
bi keser û bi dengekî melûl, got
- Tahar Xan~ 'Mîrê m no
'
Gulê, mehrûmê, tl
Temo, lawo
fe ek et xayin e
Xayina felekê ev jî
75
b min kir, ava reş bi çavên min de gêr kir, dinya 11 ber min heft qat binerd kir
Her du çavên min kor bûne
ji dengbêjî û stranan e

Temo, lawo,
de rabe
bi destê bavê xwe bigire
Gulê
şêrîna ber dilê minê, de rabe
min bi doxtor û hekîman bigihine
Niha, piştî ku me serpêhatiya korbûna Evdal jî, hi
peyv û gotinên xwe yên kêmbiha, weha salix da, em ê bi Evdal re herin û binihêrin ka çt pê diqewime'
olli
76
3
Salên re, û tarî
Dinya bi dor e, geh lijêr e, geh h jor e Carina roj e, carina şev e
Ev t rê, adet û ûsilê dinê ye
Evdal
dengbêjê milet, bi carekê kor bû
Qudûma wî şikest, daxwaz û kêfa wî daket
çaxa Evdal kor bû, salê wi nêzî
- şêstan bû
B ekî mezin ji jiyana wî, wekî ku birûskekî vede, hat
ibû û çûbû
Niha dinya wî guherîbû û heyameke nû dest pêkiribû; heyama
reşahiya dinê û korahiya allemê
Ji wê şeva ku Evdal kor bû û heta wê roja ku Evdal xwe 11 Sîpanê Xelatê girt, heft sal ji navberê bihurîn
Heft salên reş û tali
Welê reş û tarî ku di her destpêka Newrozekê de, Gulê
ji kerba, digot, "sal bi sal
xwezî
bi par,"
Piştî ku Evdal kor bû, Tahar Xanê bijîjk
hekîm, şêx, melle û xoceyên dinê anîn ser Evdal

Wan çi derman 11 ber destên wan hebûn, dane Evdal, li serê xwendin, jê re berbejn, h1cab û nivişt
çêkirin
Lê çi feyde
dermanê Evdal tune bû
Korbûna Evdal1t welêt belav bû
Ji her çar aliyên welêt, kalemêr, pîrejin
aqilmend
xwenda û zane, xwediyên ilim û irfan, xwedtyêi kitêbên sfhêr û
77
remlan hatin sertdana Evda t lê jê re tu, çare nedîtin
Ji wê rojê
Evdal têgihişt ku çavên wî dê bi derman, giya
Iênfhêrîn Û xwendinê venebin
Ew
têgihişt ku şîra çavên wî ttştekt din e
Rojekê, gava oda wî, dîsan
tijî meriv bû, wî weha got
- Gelî hevalan, nabe, ez hi Inctla Isa kim nabe
Ez bi Zebûra N ebi Silêman kim
nabe
Ez bi Qurana Mlhemed kim, nabe
Heta miriyên sedsalan ,Ji serê xwe ji tirbê htldm û ji gorê rabin
çavên bavê Temo û Tavbanûyê, ku, n,e bi emrê rehm
dilovanî 'û însaniyê be
bi hekîm û t oxt oran, qet sax nabe
Herweha Evdal dest pê kir û kllam û stran avêtine ser korahtya xwe
Tetno, lo lawo
ava Mirad û' Ftradê tê û gur dimeşe, Th rabe bavê xwe siwar bike lt hespê kumeyti kapreş e
Min ji av û çeman derbas ke
min baoê ser hekûnên Hebeşê
Hekimê bibê

Evdalê zeynikê,
çavên te kor bÛTL eva çend e?
Ez ê btbêttm
çavên, min kor bûne, iro bûye demeke
Hekîm! btbê, Evdalê Zeynikê, çavên te ne koranî ye
ava reş e
~
Her heyam bi xwe re kirasê xwe ,ji tîne û li mert-
van, dike
~
Heyama nû guherînên mezin di Jîn û mala Evdal de anî pê
Ew niha kor bû
E\V hew dikarîbû, her gav, her wext, li, nik Tahar Xanê bûya
Gerçi Tahar Xanê ji qedr û qîmetê tu 'tişt, kêm ekmbû û her tim hala xatirê Evdal dtptrsî, lê Evd,a bi xwe
nedixwest bibe bar
wi bi dileki şikestî Û keserkûr biryam xwe da;
wî dê hew dengbêjiya Tahar xanê biklra û ji Tahar Xan tika bikira ku Şêx Silê bibûya cîgirê wî
Gava Tahar Xanê biryara Evdal bihîst, ew li ber biryarê ket
Biryar ne bi dilê wî bû
Lê biryara Evdal mîna hestnê pola bû, nedihate birîn
Rojekê Tahar Xan, çend aqilmend û dostên wi û
Şêx Silê
bi hev re, hatin mala Evdal û Gulê
Pişti silav û kilamê û hal
xatir pirsînê, Şêx SUê çû destê
Evdal 'û ew ramûsî 'û got,
_ Evdalê Zeynikê ye
pîrê me dengbêj û stranva-
- wtî- :A
ekî min h b bent li
nan e~ er çe 'u qusur' _ ,-' ' e -e

ez em me, -
min megtre
TU yî, de gbêjê xelkê
dengê welatê me û em hemû telebe û şagirtên te
Ez Şêx Silê me
li ser ders û şopa te
Bila derd û xem ji te dûr bine
Li min eyan e: li pey zivista ê bihar e, 11 pey taliya şevê ro-
nahiya sibê ye
Evdal destê xwe bir pişta wî û lê vegerand,
- Şêx Sllê tu birarziyê min I, ez apê te me
Em dengbêj û hunermend mîna kurên malekê ne
Gava tiştekî li yeki qewimî yan bihn 11 yeki çikiya
yê din berdewam e
Şîreta min li te, şîreta apan e: bi deng û hunermendiya xwe bawer û bflmd
b nefsa xwe camêr û rind be, deng û awazê Mîrê xwe, canfe-
dayê zimanê welatê xwe be
Çi hekîm e
ji birînên xwe hînî hekimtiyê bûye
Bila riya te vekirt oxira te bi xêr be
U ez dizanim; şevê here, roj ê bi ser min
de were
Tahar xan Jî bi derd û kul bû
wî dikir ~ nedikir
tiştekî J destê wî nedihat
Bêgavî û bêçaretiyê bihn lê dtçikand
Xwarin û vexwarina mala Evdal her 11 ser wi bû
wi ji başan baş, ji xweşan xweş
tiştekî texsir nedikir
Lt we1atên kurdan her beg
giregir û mîrekî bi dengbêjê xwe serbilJnd bii
Tahar xan ji
hemûyan serbilindtlr bii

- Evdalo
bextreşo, dengbêjê min ê yektayo
wi ji
79
E
g
~ydal re got
Tu bizanibî ku derdê te derdê min et, dengê te li ber d11ê min e
Tu b1zan1bi ku ez dixwazim malê dinê
milkê Kurdistanê 1 ber lingê te birijînime
De bibêje
çi bi dilê te ye
Avahî û malekê ye? Mulk û aşekî ye? a
Hingê Evdal keniya û li Tahar Xanê vegerand,
- Mîrê mino, qeda bê mal û mulkê dinê
her tişt li aliyekî ye, ji meclts û dîwana 'te btdûrkettn derdekî bêhempa ye
Daxwaza mtn, sax û selametiya te, biserketina miraz û amanca te ye
Tu her hebî mîrê 'mino
Lê mixabin, me çawan li jorê ji gotibû
di wan salan de
xirabî û nertndt li pey hev hatin
Bi dû korbûna Evdal re sê sal
Tahar Xan 'wefat kir, serê xwe danî axa sar" diyarê rehmetê
U bi axîn û nalîna hesreta 'Welêt
axa bav û kalan
Pişt
korbûnê, bi qasî şeş mehan, Evdal 'û, Gulê serê xwe dan ser hev
bi hev şêwirîn û xwe bi biryareke nû gîhandin; wan dixwest bajar terk bikira û xwe bispartina çiya û gundan, Evdal
bi alikariya
Temo
derket meclîsa Tahar Xanê û biryara xwe Jê re got,

- Mîrê min, eger tu rê bidî, me dil heye ku em herin li gu dekî bi cîh bin
Meriv divê pişta xwe yan bide mêrekî zexm
yan ji çiyakî asê
Min heta niha pişta xwe da mîrekî bêhempa, niha jî
em dixwazin, bi saya û alîkariya Mîrê xwe, pişta xwe bidin çiyakî asê
Tahar Xanê ew bi dawe il dîlan
qedir û qîmet, deng û olan bi rê kirin
Evdal
Gulê
Temo, Bengîn, Meyro û sê dostên mala Evdal û Gulê yên dengbêj danê êvarekê dan rê
BI, qasî bîst siwarên Tahar
~
Xanê f
bi wan re
heta gundê ku ew ê btçûnayê, çûn
û ew li wir bi cîh kirin
Gund li pala çend gir û çiyan ku, 11 ser tixûbê Ecem bû, hatibû avakmn
BO
Dt wan salan de, rewş li welêt, bi carekê, xirab bû
Li gelek deveran şer di navbera mîrekanên kurd
yan ji di navbera muslim û nemuslîman de derketin
Welê dixuya ku tiliya dewleta Osmanê Alî di wan şeran de hebû
Ji ber ku, bi geşbûna a
girê şer
re, Osmaniyan ji
bi ordiyên xwe" êriş anin ser kurdan, Wê demê du paşayên Osmanî Kor Reşîd û Pala Osman Paşayên mal1kşew1tî welatê Kurdistanê bi ser û binê, hev kirin, û ew şewitandin
Her du Paşa jî d1lxwar û zikreş
xwînî û mêrkuj bûn

Dewleta Osmanê Alî pê hesiyab AL ku hin ji mîrekên kurdan 11 xwe vegerîbûn û bi doza yekitî û serbestiya welêt civat digerandin, xwe bi çek dikirin û haziriya şerekî :ftreh û dirêj dikirin
Kor Reşîd Paşa ji bakt r, Pala Osman, Paşa ji başûr, tevî ordiyên xwe
ketin welêt û çt hat ber wan, hilweşandin
şewttandm
Ordiyên wan bi quwet û bi hêz bûn
Kurdan nikarîbûn xwe li ber wan bigirtana û ew Ji bo şerekî fireh ne hazir bûn Her tişt
ji nişkekê ve
bi serê wan de hatibû
Herçî Tahar xan bû
ew bi xurtî li dijî ktrtnên
Paşayê
malxirab sekinî
Wi name şandin û meriv hmartm Stembolê û xwest ku St emb ol rê 11 Paşayên zalim bigire
Lê wî tiştekî bi dest nexist
Ji bervajtyê, tiştên hebûn jî
ji dest çûn
Rojekê KOr Reşîd Paşa
tevî ordiya xwe ya stûr, avête ser erdê mîrekiya Tahar Xanê û di nav çend rojan de hemû nûrekî vegirt û çû li qonaxê Tahar Xanê rûnişt
Wî
,
allm û 11 d êb
k
ar n
zar u zeç
_ u aq men ,re
'er u u-
'ma nd arê Tahar Xanê şandin Stembolê
Şêx Silê ku bûbû dengbêjê Tahar Xanê ji

pê 're bû
Li Stembole JI ew 11 giraveke pir dûr ku kesi nizanibû li kû ye, nefi kirin
Tahar Xan JI erdê bav û kalan
axa
tnd
A fling d t û
şe , ,
ev1D-8ran
ware şer up
-
- an,t
,eş 'U zoza-
nan bi dûr ketibû, Ji navberê pir nebthurt
wî serê
81
T
a
b
X
a
b
i
d
Û
xwe danî
11 wir', li welatê xerîbiyê
çû rehmetê
Bayê tofana ku 11 welêt rabûbû
pir bi zû, xwe bi gundê Evdal gihand
Beri sê salan Evdal Tahar xan
û bajarê qedîm ê Tahar Xanê terk kiribû
U niha
piştê sê salan, bayê tofanê xwe bt Evdal jî digihand

Gava Evdal xeber bihîstin, ew li cîhê xwe hişk, bû t rengê wî qultpi, bû wekî rengê xweliyê
Ew bi hêdîka, li cîhê xwe
:rûnişt Û bi hêdîka got
Axxx felekê, xaymê axxx
~ 'te ev ji bi serê me de ani
Bl du ve cimlê 're, çel roj û çel şev gotin J1 devê Evdal derneketm û wi çel roj û çel şev, ji, rojê taseke dew û gepeke nanê hişk :pê ve, tu tişt nexwar û, venexwar
Em ê niha Tahar Xanê li gorê 'rehet bthêltn, li Evdalê Zeynikê
qehremanê çîroka xwe vegerin 'û wî bigirin û pê re herin, cem şagirtên '\VÎ
82
4 Şagirtên Evdal
Bûyerên welêt Û mirina Tahar Xanê: dilê Evdal ktr goristaneke wêran
Xem û keser bi ser wî de hatin
dilê wî bû payiza xem - keseran
Welê bû ku pir caran, ew b rojan, 1 hundirê malê
11 ser doşegan rûdinişt û bêdeng dipojtnt
BI dinya derve re têkiliya wi zêde nema, Bi tesira bûyeran
ew hînî dinya koran bû
Perda slhêrin a korahiyê li ser çavên wî vek!ş1yabû
Bêyi: renge t, rengên din j1 ber çavên WÎ winda bubun, Bi tenê rengê reş mabû, Sorah iya htngurê, stpthtya ewr û berfê, keskahtya deşt û zozanan keskesora barana biharê
zerahiya ro 'û, tavê 'winda bûbûn
Bi 'tenê reş, şevereş mabû
Gava ew ne kor bû û wi bi çavan ronahiya dinê didit, heşê wî qet neçûbû ser roj
danên rojê - guhenna rengên wan
Gelo rengê berbangê çawan bû? wî rengî çawan xwe dtqu ' pand ser rengê danê sibê? Danê êvarê, gava ro diçû ava, aso çawan xwe d eqişand

û dixemfland? Ew zozanên bilind '0, asê yê welêt çawan kirasê zivistanê~ berf û pûkê Ji xwe dikir û kirasê biharê
nermt Û genn1yê 11 xwe dikir?
U ew' şal
şapik, pişt
işlik
kirasên rengîn ên
83
Tahar Xanê çawan dibiriqîn?
Di warên rengan de, Evdal şi- gtrêdabu
Edî ji, mij Û dûmana rengê reş pê ve, tu reng û celebên wan nîn, bûn
Di wan salên reş de, pir caran, diya, Evdal,
jinebiya 'bextreş zeynê dihate bîra Evdal
'Em dikarin bibêjin ku, Evdal bavê xwe nedît
Gava Evdal ptr biçûk bû, bavê wî wefat kir, Ew' maleke reben û belengaz bûn
Bavê wî şiva - - gavanî d1k
1r û diçû ber pez û dewarên xelkê
Li welêt, zivistana berfa sor bi nav û deng e
Di wê ztvistana berfa sor de, xela û nexweşiyê bi ser welêt de girtin û bi deh hezaran meriv birin gorê
Hingê bavê Evdal jî
Evdal û diya wî Zeynê li pey xwe hiştin û çû gorê
Hembêza dê bû star1ya Evdal
Zeynê nexwar t 11, lawê' xwe da xwarin, 11 xwe nekir I bi lawê xwe da lJXwektrtn, Wê mêr nekir û 11 ber çoka lawê xwe rûnişt û ew' xwedî kir
Mîna teyran
wê per û perwazên xwe bi ser lawê xwe de girtin û nehişt ku felek û dewran 11 ser lawê 'Wê bigerin Hembêza Zeynê ji Evdal re bû ",'arê germî, ner mî, dilovanî, rehmet
'û şefqa tê
Lê dtya Evdal, Zeyna bêçare, zêde umir ekir û

çaxa Evdal hinekî mezin bû û êdî dikanêû xwe bi hawara diya X\Ve bigihanda
hingê Zeynê jî çavên xwe girtin
Evdal 11 meydana dinê bêkes û tenê ma
Ew' hembêza dtlovan, gotin, çîrok
mesele û destanên şevan û xebe danên mina zêr û yaqûtan riya dengbêjî û hunermendiyê 11 Evdal vekir
jê re bûn kahmya jin û aftrandmê, hêz û quweta sebir û
pêşketinê
Hesreta malwêran dilê Evdal d:lk:izlra
nd
wî bêrî
11 diya xwe Zeynê
mîrê xwe Tahar xan û rojên xwe yên bib rî
kel û heyecana, dil û dîtina çavan ,dikir
Lê JI destan Çi dihat? D1 wan rojan de
şev-ekê
Evdal xewnek dît
wî di xewna xwe de her tişt bi, çavan dît
Zeynê
Tahar Xan
Gulê, bavê Gulê, bavê Bengîn
84
dengbêj Û stran vanê welêt rûniştibûn û li çepikan dixistin Û dtxwestm ku Evdal stranan 'bibêje
Tevgera wan xurt, rûyê wan bi nûr bû
Wan bi kêf û henek bang li Evdal dikir
Şêx Silê jî 11 wir bû û 11 bilûrê dtxist 'û rê li ber Evda rast dikir ku Evdal destê xwe bibe ber guhê xwe û qutiya dilê xwe veke
Dotira rojê, Evdal xewna xwe, bi girîn, ji Gulê re
got
Girîna wî hem ji kêfxweşiyê hem jî Ji xemgîniyê bû
Ezîzên ber dilê wî hatibûn xewna wi

, lê
ew ê, êdî, bi tenê
bihatana xewna wt, War û hebûna wan dij1yana Evdal de, êdî, xewn bû
Gulê b xebera xewnê kêfxweş bû û jê re got
- Evdalo, mehrûmo, dermanê dil sebr e
Sebr jîji xebat û şux1l pêkhatî ye
Xelkê baş gotiye: hesmê ku neşuxl
le, zengarî dibe
Ma te fahm nekiriye, ew bi çi amancî hatine xewna te? Ew dtxwazln dengê de neyê birin û dengê stranên te li esmanan be
lehiya dllê te nemiçiqe û her berdewam be
Evdal bi hinekên dm jî şêwirî
Wan jî mîna Gulê
gotin
Bi ser gotina Gulê û dostên dtn, Evdal dîsan destê xwe bir ber guhê xwe û rahişte tembûr û bilûra xwe
Evdal Bengîn jî girt ba xwe û wan bi hev re, tariU û 'bêdengiya şevê qelaştin
Bengîn êdî bûbû mêrekî çeleng û dengbêjekî jîr
Ew li, ber' destê Evdal mezin bûbû
Digel ku ew xort bû, dengbêjekî bi dilê wejê derketibû
Kemilandin û pêşketina Bengîn fikrek xiste beşê Evdal; ma wî nikarîbû xort li, dora xwe, btctvanda û ew hînî ders, adet û ûsilên dengbêjiyê bikira?
Ev fikir kete hese
h al ~ d t
, -Evda1j-- u -, ev U '08 -en - - -- - - 1
,
Mekteba Evdal bi vî aw'ayi hate meydanê
Hinge H welêt bi hezaran dengbêj hebûn
Hema çi bigire, di her war û gundi de
çend dengbêj hebûn
Dengbêjî, stranvanî, çîrokbêjî, govendgêrt bi qedtr û qîmet bû

Welat feqîr û nezan, bi tenê - ji dinê dûr bû
85
Gulê Xwendin Û nivisîn kêm
qise û gotin bi quwet bû
Rêber, pêşeng û xwediyên qise û gotinê dengbêj bûn
Terbiye û perweriya dengbêjan ne bi xwendina mekteb
medrese û xwendegehan
lê bi ders û tecrubên jiyanê bû
Dengbêjî û hunennendi adetê bav û kalan bû
Ji do hatibû, ber bi rojên bê diçû
li pi ê dengbêjan Evdalê Zeynikê dest bi
hinktrt t - """" rt l
1
b ""
, "'-' na ewan u xo an ft
Ul' U
Mekteba Evdal 11 welêt deng da
Ji gelek warî gelek xort hatin Evdal li
kêleka mala xwe du xani dan avakirin û xort II wir bi cîh kirin
U axa
beg û mezinên kurdan bi mesref, xwarin û vexwarina
şagirtan rabûn
Hingê bthna Evdal h; nekî vebû
heşê wî' hate serê 'WÎ
Ew mij û dûmana ku bi ser mala Evdal de girtibû
be av bû
Hilm û bi na xortanî û şênahiyê li malê belav bû,
Evda bi
kêf' û daxwazî
bi karê xwe rabû
wi dest pê kir û xort hinî adet
qayide, rê û ûsilên dengbêjiyê kir

Evdal dersên ziman û edebiya ta kurdî Ji dida û şaîr û nivîskarên kurd, ên sedsalên 11-12-13-14-15
16-17-18
an bi şagirtan dida nasîn û ŞÎlr û eserên şa- Q nivîskaran dixwen-
din Evdal stran
destan, mesele û efsane şerh diki rin û kahniyên "Wan digotin
Dost û hevalê Evdal ên dengbêj jî' dihatin, carina bi roj an, carina bi mehan, li wir diman û alîkarî li Evdal dikirin
Evdalê dewr û
dewran, dîtî behsa tecrubên xwe dikir 11 şîretên xwe J1 şagirtên xwe kêm nedikir
Carina wi weha ' wanştret dikir,
- Şagirtino
hêviya we atê mino
ji bîr mekin; dan û standina dengbêjekî û peyv û gotinê mina dan û standina nêçtrvanekt - nêçîrê ye
Nêçirvan divê hay ji rewşê û hal 'û hewalê dinê hebe; şop hilde
li şopê hûr be
xwe bide pey nêçîra xwe û wê bigire
U gava ew nêçîrê digire
dilovanî û nefsbiçûkijê kêm
86
,
nebe
Dengbêjekî jî divê weha, be
'U hûn dizanin, gelo nêçîrvanê herî yekta kî ye? Ew kes e ku dizane riya nêçîrê ji kû dere û xwe bi wê riyê digire û dere li benda nêçîrê disekine da ku nêçtr bi xwe 'were
Hûn divê xwe bigihînin vi katî
Hûn divê peyv û gotinê bibêjin bi hostehi da ku gotin bi xwe were ber we bi rêz û rêzdarî
Kêfa şagirtan, pir j:l ders û gotinên Evdal re dihat
Lê JI hemuyan pirtir, kêfa, Meyro û Beng-

~h~
Em ê niha, disan, vegerin ser çiyayê Sîpanê Xelatê û ji wir jî heri cem Meyro û Bengîn, dildarên bextreş ên vê dinyayê
87
88
ŞEV
89
90
1
Agirê şeva çiyayê Sîpanê
Sîpanê Xelatê bilind e û serî bi mij û dûman e
Ew 'hevalê ewr û esmanan, heyv û stêrikan e
Dengê
ba û bahozê, baran 'û birûskê" rawir û 'teyr
av û kahn1yê û dengê Evdalê Zeynikê jê kêm nabe
Ew çiyayê destan û efsana , hêlîna Xecê û Siyabendê û warê Evdalê zeynikê ye,
Evdal
Gulê, Temo" hevalên 'wan, şagirtên Evdal û gelek kesên din, li serê Sîpanê Xelatê, li kêleka golê
11 doral1ya agirekî gur rûniştibûn
Derengê êvarê bû
Ev'arê xwe, diqulipand şevê
Esman zelal
stêrk 'ronî bûn, Heyf d birlqî û diçû ava
Dinya
çiksayî bû
Şewqa êgir û stêrikan li golê dixist û ava golê pê dtbtrtqt
Dengên ku heval û hogirên Sîpa'nê Xelatê bûn" bi dengê Evdal re yek dibûn
Li Ev'dal beyan bû; ew şev t şeveke pîroz bû
Wê şevê dê tiştine meztn, ecêbme giran, btqewtmlyana
Jina Temo Zînê li ber we idandmê bû

Keser û kerba Evdal kel dabû
Xwendina quling bêpayan bûbû
Hejmara şênî û xelkê pir ~ pir zêde bûbû
Ji çiyayê Şengalê
warê Meyro
Bengîn, dengbêj, nûçeyan tl xeberguhêz, her bîskekê, dihatin û xeberên nû dianîn û gulokê'n agirê serê Sîpan,ê
91
Xelatê
her ku diçû
zêde dibû
Wê şevê dê tiştine bi-qewrmiya,
Ji lewre
'Evdal nexwestibû i nav konê xwe yê reş rûne, Ew tevî civata xwe htlkiştyabû serê çiyê
nav şeva reş, Civat Û xelkê jî dabûn pey 'wî, ji konên xwe derketibûn, hUkişiyabûn serê çiyê
li wir t li kêleka golê, bi êzingan vêxistfbûn agirekî germ Û geş, Lê xelk ewçend 'pir bû ku ew mecbûr mabûn peregende rûnin û cihê cihê agir vêxtnm
Li her all
xelk, kom bi kom, rûnlştibû
Li serê Çiyê Û li her
aliyê pal
quntar û kenda ên çiyê agir hatibû vêxistin
û di
nav şeva reş de
çiya sor dikir
Meriv digot qey
dilê çiyê hildavêt û
ew hatibû xezebê,
Wê rojê, ji destê berbangê 'heta şevê, bêyî ew kêlîkên kin ên xwarin û vexwarinê û çûyin

Û
hatina konê, Evdal her' û her gotibû
Geh b:l kilam Û
stran, geh bi
tembûr û bilûr
geh bi qise û gotin
Evdal li rojên xwe yên kevn
vegeriyaba û bûbû mîna
berê
Awaz û dengê wi dih
eriki û dem
dewr û dewran dida ber xwe, Sîpanê Xelatê bi serîhildana dilê Evdal olan dida
Olana dengê Evdal J1 çiyê xwe diguhezand hemû aliyên welêt
Şev hatibu
Evdal
kulavên şivanan l ser milê WÎ
li ber êgir rû
n1ştlbû û digot,
Ez Evdal im, ez Evdal
Un, Ji ber neheql û bêbextiya vê dinyayê, ji kezeba xwe birîndar im, De h ekûn Û
doxtoran bÛ1tnJt bo her du çavan
ez Evdal ûn, Ez birindar 'im, ez heval fm
Şewqa êgir li :rûyê Evdal dixist û rûyê wf, mina dilê wi, germ dibû
Rûyê Evdal sor dildr~ Çavên wi 'yên nedîtî vekirt, ruyê wî ber bi êgir bû wi
92
ber wî bi rengekî sor û xweş diŞewitî
wî dil dikir ku rengê sor zora rengê reş bibe û loma wî digot û digot
Ew pê dihesiya ku stêrk û çirûskên êgir dtkettn nav hev û serê Sîpanê Xelatê û esman bi hev re dibû yek
Wi dixwest ev xweşiya dinê bidtta

Wî dixwest bibine
bi çavan lt dinê b:tnihê e
Bi dû stranê re, îcar bi gotin
wi ji guhdarên xwe re got
- Gelî guhdaran
şevê kirasê xwe yê reş avêtiye ser me
Agirê 11 ber me kirasê şevê dişewitîne
Hûn bîr bi 'tiştan dibine û dtzanme
gava meriv nikaribe bi roniya çavan bibine
hingê meriv dij î bi daxwaz, xwezî 'û hesretane, Dîtina hilatina tavê hesreta min e
Lê, şevê ez dil gtrtrme, li ber çavên min her û her
şev e
Şev
şeveke dirêJ
bêser û 'bêber e, kirasê xwe bi, ser min de kişandiye
ji min b:l dûr nakeve
Ez stranan davêjime ser siya dewranê, şaşiya dinyayê u er izvanen VI şaş ye em me vane
eşa şeve ez
xistime ser rê û rêW1'1iya e
Bi stranan, ez dlgerime 11 nav gund û bajar û welat ane
Dinya ava ye
herkes 'bi aqUê xwe tê de şa ye
Şahiya min ziman, û stranên kurdî ye
Şah ya min agirê dilê min û hûn, xort û çelengên welatê e ne
Xweziya dilê min ew e ku, agirê dilê min bişewitîne kirasê şevê, tariya ztndanane
Evdal bi dengekî zîz û melûl dipeyivi
Hesret Û qîrîna dilê wî dilê guhdaran dtşewltand
wi pir bi giran! û bi, keser gotinên xwe digotin û dilorand
Hin jinên civatê hêdî hêdî digiriyan
Gulê ji~ 11 kêleka Evdal

hêsirên çavan 11 ser htnartkan, bêdeng
dibarand
Evdal fahm kir ku Gula wi ya dUbirin hêsir dirijand li gotina xwe dadiqurtand
Hingê Evdal bi destê Ou ê girt û gotina xwe lê vegerand,
- Mehrûm!, Gula mmê, dilsoza qewlê minê
93
dizamegtrî, melorîne
Li ser rûyê xweş û sorhinarî hêsiran mebarîne
'Ez ê li ser siûda, xwe û quling 'û li ser siûda Tavbanû û Bengîn kilam û stranan bibêjime
Li jor Xweda kerîm e Ev heft salên min temam e, ez kor bûme, min ji hekîm û doxtoran hêvî biriye
11 hêviya quwet û hikmeta Sîpanê Xelatê mame
G la minê
ştrhelalê, bila şîrê te 11 te helal be, ka em binihêrin, dawiya me çawan dibe
Gulê destê Evdal mist da, ew ramûsî, 11 ser rûyê xwe gerand û hingê, bi girîn
'Evdal vegerand,
Evdalo, mehrûmo, sebra ber dilê mmo
i
Ez, Gulê me
gula xweşb1harê me
Ez bala xwe didimê
feleka Evdalê min, paşiya hemûşka wê kulek tê
,Ez deng lê dikim
dibêjimê
'f felekê, tu qet xêrê nebînî,
xêr bikî, xêr nebtnt
çima tu Evdalê min ê lawê
d - ,- - d
ê bi wî dik

î?
yne ,'eşlnl
nemer u neç y'an " W
l", ,entn1'
~
De felek
sed car felek
,; ev bûne eft sal
ez kil nadim ser çavên belek
Eger bfbûya, 11 dinê biqewimiya
min ê her du çavên xwe
bi helalî û xweşî, bi çaven Evdalê xwe re blguhertya
tl Evdalo, mehrûmo, bila d bi dil be, cîhê meriv zîndana sar û 'tarî, xwarina
' meriv xwelî
baliva bin serê meriv kevir be
Heta ez hebim
quwet terkî min neke, ez e 11 vir bim, 11, cem te
Ez ê bi bîr bînim wan rojên me
evîna min û te
Jl destê min çi hate, ez ê btktme ku biguhere
siûda te
Wê şevê herkesî pişta xwe dabû felekê
oxira xwe dabû dinê
Dtnya, warê tevger, 'bûyer
guherîn û ecêbên giran bû
Her tişt lê dtqewtmt
Xelk, 11 hêviya bûyer
guherînên dinê bû
Pêla xelkê rabûbû, Agirên ku ji serê çiyayê Sîpanê Xelatê radibûn, welat
ronî kiribû
Bê qîrîn û teşqele t bê lec û şer
"Destê tenê şêrê zozanan be
dengjê nayên

ev gotina Evdal ji guh veguhezîbû guh Û xelk pê rabûbû
xwe bi çiyayê Si,panê girtibû
Bêdeng, bêpejn, bêwest û
94
bêrawest
Bi germtya dil, hizra beş û heyecana ruh
Di derengê wê şevê de
Evdal ama ji şagirtên xwe re
weha digot
_ Şagirtino
dilgeşino
hûn dengê xelkê ne
Hûn
bendewarên ruhê wi, qasidên hîs û canê wi ne
BiIMnlne
bilezinine, mîna min
gotina do û pêr werbigtrme, gotina xwe lê zêde bikine
11 gora xwe biguherînine û bi pêşerojê biguhezînine
Hûn bi xwe btaftrtrune, siûda merivan û halê bûyeran bikine kilam û stranme
Bila kêmaniya hunermendiyê tê de nîn be û ew l1hevhati bine
Li xelkê guhdarî bikine
pê alaqadar bine
bala xwe b1dinê û wan seh bikine
bi gotina xwe, bi rabûn û runiştina xwe nerm bibine, qedrê gotina xelkê bizantne, 11 zexelî, xeletî û çewtiyên xwe muklr werme, gotina xelkê mebtrtne, bîhnftreh û bisebr bine
Xêr, feyde û sûda welat, xelk û zimanê :xwe 11 ser her tiştî re big1rt-
ne
Derengê şevê, gava zaro
û xort ketibûn xewê û
êdî bûk û zavayên nû çûbûn û ketibûn nav konên xwe û civata serê Sîpanê
Xelatê sist bûbû, hingê xebereke nû veguhezî civatê

Sê siwar zengu dabûn hespên xwe û heta qonax bînine ser çiyayê S~panê
Xelatê nesektnlbûn
Ew J çiyayê Şengalê hatibûn
Li gora xebera wan
Şopa Meyro û Bengîn
digihîşte heta ber devê çem û newalekî çiyê û xelkê xwe dabû ser şopê
Lê wan nizanîbûn ka Meyro û Beng-m sax
bûn yan nesax,
Xwendevanên bibnftreh û btsebr, niha wext
hat
em ê, tcar, bên cem Meyro
keça bextreş, bûka ciwan û bizanibin ka Meyro ki bû û çi pê qewimibû
-
95
96
2 Meyro
Siûda keça sêwî Meyro xirab bû
Gava ew hate dinê" nivîsa eniya wê xirab hatibû ntvtsîn
Meyro keçeke ermen bû
Bav û diya wê du gundiyên ermen bûn û li aliyê serhedê
bakûrê welêt, Ji gundekî ermenan dijiyan
Ew di halê xwe de bûn û haya wan ji dewrana dinê tune 'bû
Bi qasî bihustekê erdê wan hebû û pê
bi zehmetî, debara xwe dikirin
Ew li wir
çend gundên ermenan bû û li doraliyê wan, gundên kurdan hebûn
Kurd û ermenan li hev dikirin, diçûn û dihatin eer hev û bi hev re: mertvatt û ldribatî dantbûn, Dinya wan b tenê gundên wan bû
- j- bi
b - P Il kî
kî
tl ew," qnna warr pu
arryex nan, seriye pîvaz kêfxweşî û şênahlya wan bû

Wan ji kesekî tiştekî nedixwest û dia dikirin ku kesekî ji wan tiştekî nexwaze
Lê wan nizanîbû ku şûrê dewleta Osmanî Ji
kalan kişandî b- û li ser serê wan hilawesti bû
Wan JI kesekî tiştekî nedixwest, lê dewleta Osmanî Alî
wekî Ji her kesi, ji wan jî her tişt dixwest
Rojekê, gava Osmanî û Uris ketibûn nav şerekî dijwar
hilma agir xwe gîhande wan gundan jî
97
Dewleta Osmanî li ermenan ji hatibû xezebê
Li gora gotina dewletê
mane ermenan ji ptştgtrtt li ûrisan dikir
Osmaniyan dek û dolap li serê ermenan digerandin
Herkesî pê dizanîbû, kîn nefret û rika Osmaniyan bêhed û bêhudûd bû Osmaniyan ew kêfxweşiya pariyekî nan û seriyekî pîvaz ji gundiyên ermenan e pir dîtin û avêtin ser gundên wan, agir li, "Wan barandin mal û mu kê wan hllweşandin û şewitandin" xortên wan kuştin kal 'û, pîrên wan nefî kirin pey heft welat û dtwêlan, gundên wan bi erdê re yek kirin talana wan rakirin, pez û dewarên wan bi xwe re birin û tovê ermenan qelandtn, Welat dîsan ketibû nav nalîn û şinê Di wan rojen reş de ji 'bo gerandina hm kar û şixulên Ta,har Xanê, Evdal, tevî çend aqilmend û qumandarên Tahar Xanê" li bakûrê welêt, nêzîkê şer û tofanê bû Gelek melle, şêx: û axayên kurdan r alikarî 11 osmaniyan dikirin û bi karê wan ê kirêt radibûn û ermen dtkuşttn
J:i ber ktr ermen xaçperest bûn, Ol û dîn zora, însantyetê biribû
Evd,al li wan gundan digeriya û hawar li kurdan d1kir û digot,
' Kurdino
qasit bêzewal e
Ez dengbêjê xelkê me, Mekine, ermenan mekujine
Ennen pismam û cîranên me ne
Guh medtnê, xedar û mêrkuj bê nan - xwê ne
Bêbextiyê li ermenan mekine Bêbextî ne karê camêran e

Lê di nav wi agirê lec û şer de, Evdal nikarîbû dengê xwe bi kesî bJgihanda û ji destê wî, Ji gotinê pê ve, tu tişt nedihat
Rojekê
çaxa ew li gundekî bûbû mêvan, wt bihîst ku çend gundiyên wi gundî çar zarokên ermen ji mirinê xelas kirine û ew anîne gund û veşartine Gundiyan zarok nêzîkê g ndeki ermenan di nav daristanekê de dîtibûn
98
Zarok 11 dora miriyekî rûniştibûn û dikirine qîrîn
Welê xuyabû mirî gundiyekî ermen bû û wî zarok bi daristanê gihandibûn û li wtr, ji ber birînên xwe, miribû
Gava Evdal hebûna zarokan bihîst
wi xwest wan bibîne
Zarok çar bin sisê law yek keç
Umrê wan di navbera du û çar salan de bû
Ew xweşik û şêrîn bûn
Haya wan ji xezeba osmaniyan
tofana qirbûna ermenan, siûda bav û dtyên wan nîn bû
Dilê merivan bi wan dişewitî
Gunehê Evdal pir bi wan hat
Çi sûç û gunehên wan zarokan hebû? Çima bayê felekê li ber g hê wan ketibû? Evdal bi dûr û dirêjî li wan nihêrî
Ye
ji yeki xweştir bû
Lê xweşa hemûyan keçik bû
rayê wê ronî, henarikên wê sor
u zer, en : am, U awire we r , ou,
Li serê kmcm tenik û qirêj hebûn
Evdal destê keçikê xiste nav destê xwe
Destê wê pir biçûk û wekî pembû nerm bû Keç
bi hêdîka li hembêza Evdal rûnişt
Evdal lê 'keniya
destê xwe avêt ser porê wê û ew mist da
Hingê dilê Evdal bi germahtyeke boş tijî bû

nûra hezkirin û şefqatê di hundirê wî de veda
- Eger we ji qeb- be, ez dixwazim vê keçika
mehrûm bi xwe re bibim, û bikime 'keça Gulê û xwişka Temo
Evdal bi carekê got
Ev gotina Evdal rê 11 jiyana Meyro beyan kir û qedera wê bi mala Evdal re yek kir
Her çiqas Temo gêjokî bû jî
dîsan
Evdal û Gulê xwediyê lawekî bûn
Eger Gu ê bi nexweşiyê nekettba, wan ê ji Yezdanê mezin keçek jî bixwesta Lê Gulê bi nexweşiyê ketib -
Niha
bûyerên nexweş lê anîbû; 'keça ku wan ewçend dixwest
hatlbû ber wan,
Gava Evdal vegeriya malê, wî keçik dani pêşiya xwet ser pişta Gogerçîn û hesp da xarê û hate malê
Gulê keçik bi dil û can qe bûl kir, ew car bi car
99
hembêz kir, maç kir. Temo keniya, pêl pêl. li keçikê nihêrî û ji kêfxweşiyê, Wiya keçikê gez kir. Gu.lê keçik şuşt û paqij kir t porê wê şeh kir t guliyên wê hûnandin û kincên nû lê kir. Welê dixuya ku kêfa keçikê ji. ji germiya malê, hilma şefqetê re hatibû.
Keçik bênav bû û jê re navekî diviya. Hingê' Evdal got,
- Gulê, rebenê. êdî d ya vê pep ~ kê tu yî~ Tu bt xwe, bi dilê xwe. navekî lê ke.
Bi vi awayî. Gulê navê keçikê lê kir; Meyro. Lê gava keçik hinekî mezin bû û li hev hat, Evdal jî navekî lê kir. Çaxa umrê keçikê gihîşt dehan. keçik bû çilkeke zêr û tava destpêka havînê. Hingê Evdal navê wê kire Tavbanû. Wê mina tavê şewq dida. dllê 'merivan germ dikir. Evdal ew, bi tenê. bi Tavbanû bi nav dikir. Evdal digot Tavbanû. heft Tavbanû ji devê wî derdiketin.
- Tavbanûyê, delala minê ... Tavbanûyê, porzerê,

çavbelekê, sorgula minê .' Tavbanû de were bixwe. Tavba Û, de ji 'me re strana Kezîze'rê bibêje. Temo lawo, de b: destê Tavbanûyê bigire, wê bibe, btgertne.i.
Evdal navê Tavbanû ji desta:neke navdar a kurdan Me, ê Alan wergirtibu. 01 wê destanê de, lawê ç- okê Memê. keça çîrokê jî Zînê ye. Ew her du, dildar '0, evîndarên hevûdu ne. Lê qedera 'wan xirab. dawiya wan bi xwîn e. Cara yekî, sê qîzên padîşahê periyan Me'm 'û Zînê tînine ba hev JI bo qise û laqtrdiyane, Her sê qîz perî ne, bi pe û bask û perwaz, û kezî ne. Stêrbanû . avê biçûka xw1şkan el Navê xwişka navîn Heyvhanû ye. U navê xwişka mezin Tavbanû ye.
Bi vê terhê, Evda navê keça padîşahê periyan veguhezand roja xwe û navê keça xwe Meyro ku mîna periyan b - , kire Tavhanû. Lê 'hi tenê Evdal Jê
100
re digot Tavbanû. Gulê. Temo û kesên dinjê re digotin Meyro.
Meyro. roj b roj t mezin dibû û mîna gula bexçê
Tahar Xanê vedibû. Wê ji Gulê re digot dayê. ji Evdal re bavo, ji Temo re keko. Meyro şên û şênahiya malê bû. Ew. ne bi tenê, bûbû keça Gulê, herweha, bûbû heval, hogir û sirdara wê ji. Ew her gav bi hev re bûn û her tiştê xwe ji hev re digotin. Evdal û Gulê ew hinî kilam û 'stranê kir ~ Gulê ew hinî xwartn, vexwarin. 11xwektrinê kir. Gava
salê wê kete çardehan, Evdal û Gulê li cem wê rûniştin û jê re behsa serpêhatiya bav û diya wê û ermenan kir. Bêguman. tiştên ku wan jê re gotin, dilê Meyro şewitand. lê wan nedixwestin xwe ji rastiyê bidin alî û jiyana Meyro bi teşiyeke zirav û tenik birêsin. Ew keça wan, ezîza ber dilê wan bû. lê diviya wê reh û rêçên xwe jî btnastya.
Bi dû aş .: erekir1na serpêhatiya dê û bavê Meyro re, Meyro kete nav xem û xeyalan. Ew sist bû, bêdeng ma, ji xwarin û vexwarinê ket. Li malê. TÛyê wê dîsan bi ken bû û wê ji rêz û rêzdariyê tu tişt kêm nekiribû, lê nêrîna wê bêşewq, heşê wê i derekî din bû. Evdal û Gulê pir ber vê rewşê diketin û diktrtn, nedtkmn, nikarîbûn Meyro ji tora xem û keseran xelas bikin. Gulê dihat. dtlê wê digirt.. lê tika û
lave dikir Û digot,

- Keça min. porzer û çavbeleka min ... gava ez te
weha melûl û xemgtr dibînim. kezeba min dişewite, agir bi dUê min dikeve. Ez heyran û qurbanê. weha meke. Ez û 'Evdal de û bavê te ne. Tu dizanî, ez Ji ermen Im, lê ez bi yekî k rd re. Evdal re zewicî me û
ji min mesûd û bextiyartir kes tune ... Navê te, min li te kirtye. Ev nav. navê diya Isa pêxember e. Keça min, her pexemberî dia 11 nefsa xwe ld.r1ye. Insan
însan e, çt kurd, çi ermen, çi mus1îm, çi xaçperest ...
101
Qise û gotinên Evdal û Gulê zêde tesîr li Meyro nekir, lê bi hebûna Bengîn û geşbûna evîna wan. wê, hêdî hêdî, xem û keser ji xwe bi d - r xistin û dîsan hate ser xwe.
Meyro bûbû heyva çar dê mehê. Keçikeke welê jê derketibû ku her gav li ber çavên meriv bûya. meriv
ji dntna wê têr nedibû. Bejna Meyro, mîna şitla dara henarê, dtrê] û zirav bû, Rû û h1narikên wê,
mina pelê sorgulê, sor bûn, Wê lîlok û ke:reb li ser qirikê girêdabûn û zêr û benî di ser memtkan de berdabûn. Her aliyê wê li cîh û lihevhatî bû. Ew xweşik. nazik û tenik bû. Gava Bet grn stran davêtme ser Meyro. wi weha digot,
Beina. Meyrojt g'lllan hêşfn e,
- ... :-"'" -. ...;\ k #.1; sere we SUl U Se cezi ne,
Di navbera memikên wê de s'1h û' sê kahnî ne.
Bi rastî ji, cemal û endama Meyro li gora gotina Bengîn bû. Gava Bengîn stran davêtine serê, wê jî dikir pîrqin û ji wir' direviya. Ew şerrnok Û fedîkok bû" Ew mîna melayikekê masûm û zelal bû.
Niha, em e Meyro li vtr bihêlin û werin cem heval û evîndarê wê Bengîn.
102
U
3 Dengin
Gava bavê Bet gin Biroyê Dengbêj û Bengîn, bi hev re. li ser hespekî kihêl. J'1 dûr ve xuyabûn û hatin bajarê Tahar Xa ê, hingê kesi nizanîbû ku qedera Bengîn û Meyro dê bibûya yek. Wê gavê Bengîn yanzdeh,

donzdeh salî bû. Diya wî miribû û ew û bavê xwe, li rûyê dinê b.i tenê mabûn. Bavê wî, Biro dengbêjekî baş, merivekî dilpak bû. Pişti mirina diya Beng ...
, bavê wî nezewicîbû. Ew ji
-. k koç b ... ..,A, kî .
j'" bi 'ki
eşrree ' ' ,
er' un u 'we,' eşa xwe, ew'! " awaye,'
koçerî dijiyan. Biha û havînan wan berê xwe d1dan quntarê çiyan~
deşt û zozanan û paylz û zivis-
tananjî, wan xwe dispartin gund û bajaran
Biroyê Dengbêj dostê Evdal bû. Wan salê carekêdu caran hevûdu dtdittn. hal û hewalê hev dtprrsîn û bi hev re stran digotin. Gava ku Bengîn û bavê wi hatin bajêr. payiz bû. Ew ê wê payiz û zivistanê li bajêr bima a û biharê xwe disan 11 hûn1kahiya çiyan b1g1rt1na. Evdal JI wan re, nêzîkê mala xwe, maleke biçûk peyda kiribû. Ew hatin û 11 malê bi cih bûn. Lê Evdal û Gule bernedidan ku 'ew' lt malê bisekinin. Ew bi şev û roj 11 mala Evdal bûn. Herçi
103
Bengîn bû, ew ji wir dernediket. Ji ber ku wî, 11 wir, jtxwe re du hevalên bijarte'peyda kiribûn; Meyro û Temo. Meyro. hema çi bigire, di salê wi de, Temojê meztnttr bû. Lê herwekî ku hûn pê dtzantn, Temo mîna zarokekî bû, Xwîna wan li hev keliya û ew bun hevalên dil û can. Bengîn û bavê wi şîva êvarê 11 mala, Evdal dixwarin û pir caran Ji, wir radizan.
Evdal û bavê Bengîn Biro jî, her gav. bi hev re bûn. Evdal Biro bi xwe re dibir dîwana Tahar Xanê û sifre, dîlan û dawetên dost. heval. beg û giregiran.
Biroyê Dengbêj merivekî dirêj û hinekî qe aw 'û xweşsohbet bû. Wi 11 henekên meclîsan .. , sohbeta şevan. strana zozanan û kenîna qise 'û gotinên xweş hez dikir. Ew şên û bi ken bû. U kêfxweşiya wî ya heri 'mezin li tayê dinê lawê wî Bengîn bû, Bengîn her tiştê wi bû: lawê W~. hêviya wî. domdarê tov û şopa wî, roniya çavê w L .,. wî dixwest ku Bengîn zû mezin bûya û biketa nav refên peya, ctwanrnêr, leheng û qehremanan.

Loma jî. wî pir zû Bengîn ji şîr da birîn" hê ew part ye - zarok hû, da sinetk1rin, goştê xav dayê. bilûr xtste devê. libas û pêlav lêktrtyê, bi. xwe 're bir nêçîr û seydê 'û dîwan û
'meclisê" li hespê kir. ew bajar bi bajar, gund bi gu,nd gerand, Bengîn, ev hemû tişt pir bi hêsanî h.în 'bû û
pejirand. Gava
ew zarokê hembêzê bû, wî tiliya xwe dikir devê xwe. dikeniya, û çavvekirî radiza. Hê hingê xelkê digot, "ev ttşt nîşanê aqil û fahmê ye. It
Daxwaza, hînbûnê û meraqa 'WÎ 1 ser tiştan pir bû. wî her tişt diptrst, dixWest her tiştî bizantbe. Hê di zaroktiyê de, ew hînî mêrî û peyabûnê bû.
Lê 11 mala Evdal. wî zaroktiya xwe ji peyda û keşf kir. Li wtr, wî hevalê mîna xwe, di umrê xwe
de ditin. Kêfa Bengîn û bavê Bengîn bêpayan bû Her tişt bi dtlê wan bû. heta k rojeke ji rojên zfvtstanê, bavê Bengîn Biroyê Dengbêj JI nav cîhên xwe
104,
ranebû. Her serê sibê di destê berbangê de, Biro hişyar dtbû û j:i nav nivînan derdiket. Lê wê rojê, wî kir. nektr, nikarîbû rabuya. Eş û, janeke xedar ketibû .canê wî û wi nikarîbû li ling û bedena xwe huktmbfkira. Evdal hekîm û zane anîn ser Biro. Hingê wan, fahm kir ku Biro nexweş bû û nexweşiya wî xedar 'bû; ew bi j ana zirav ketibû. Piştî demekê '\VÎ dest pê kir û xwin vertşî, Hekiman derman didayê. lê, nexweşiyê kezebên wi vegirtibûn. Ew ji teqet ketibû 'û, roj bi roj' fera çavên wî vedimirî. Bengîn her tim 11 ser serê 'bavê xwe bû û ew bi tenê nedthîşt. Ew dihat li kêleka nivînên bavê xwe 'rûdinişt û pê re dipeyivî. Biro jî destê Bengîn digirt nav destê xwe û ew datanî ser dilê xwe.
Di wan rojan de, Evdal. Gulê. Bengîn hê bi nexweşiya bavê Bengîn mijûl bûn. rojekê Bengîn, gava ew li mala Evdal wan bû, kete erdê. Heşê wî çûbû, Hekîm hatin ser Bengînjî. Nexweşiyê xwe veguhezandibû Bengîn. Ew jî bi nexweşiya bavê xwe ketibû w Lê nexweşiya wî, ê nû dest pê kiribû Bi vî awayî, Bengîn û, bavê Bet gtn Biro ji hev hatin veqetandin û wan hew hevûdu, ditm.

BI qasî du mehan" Bengîn di nav ciyan det razayî 'ma. Gava ew ji nav nivînan derket û rabû pê. êdî 'her cîh d:i nav hêşinahlyeke xweşik de bû ~ Dinya germ bûbû û ronahiyê hawirdor vegirtibû. Heta hingê jî. haya Bengîn Ji mirina bavê wî tune bû. Evdal û Gulê û Meyro Jê re her dlgotmku bavê wî sax bû û silav lê dikir. Gava ew rabû ser piyan û 11 bavê xwe pirsî, hingê Evdal _ ê re got ku bavê wi Biroyê reben çûye rehmetê, Dermanê mirinê tune bû. Kesi ntkartbû re li Rub,istin bigirta. Dinya, dinyayeke derewîn bû ...
çaxa 'Evdal. ji Bengîn re behsa mirina bavê wî kir. dinya derewîn li, ser serê 'WÎ hilweşiya. St ... na
105
hebûna wi, hîmê j'iya:na 'WÎ winda bûbû. Ew sêwî û bêkes mabû. Piştî diya wî, niha ji. bavê wî çûbû ... Çend roj 11 ser hev, ew çû ser gora bavê xwe ûji sibê heta êvarê li wir ma, axa gorê rast kir, kulîlk û gul li dorê çandin. Meyro jî alîkarî lê kir
Di wan rojan de, Evdal û, Gulê JA serî dan ber hev û 'bi hev şêwmn,
- G ,lê mehrûmê, te dî ka Çi bi serê vî aw1kê pepûk de hat?. Heval û dostên me. yek bi yek, ji me xatir dixwazin û derin ,diya'rê rehmetê. Em 11 vir dimînin bê hev-al û civat,
- Evdalo mehrûmo, nexweşiya Biro xedar bû û jê re çare rûn bû. Ew mir û xelas bû, lê gunê min bi Bengîn tê ku weha 11 meydanê bi 'tenê ma.
- Mehrûma minê. dllê min dibê ku enl vî lawikê bêkes bi tenê ehêlin û wî bernedin meydana kambax a dinya bt çerx 'û felek.
- Evd al ° , dtlpako, dilê min jî 'Welê dibê. Bila ew li cem me bimîne 9 em 'wi bthewîntn, em lê binihêrin
- Zarşêrinê. xweşbêjê, t,u xweş dibêjî. Dilê me pak, sifra me comerd, sqê me ûreh, nefsa, me biçûk. mala me mezin e. Jixwe Bengîn. jî elimiye me û mala me. Em. Meyro û Temo jî elfmîne \VÎ. Bila 'yek li me zêde be. em bibine pênc kes,
Li ser vê yekê, Evdal bi Be gîn re peyfvî, Bengîn
Ji wan pir hez dikir. lê nedixwest 11 ba wan, bima. Bi qasî demeke dirêj, Evdal, Gulê û, Meyro pe re peyivîn heta ku ew razî kirin. BI vi' awayî.

Bengtn Jî b ~ yekî ji malê 'û pardarê siûda TeJ:no. Evdal û Gulê ti evîndarê Meyroyê kezîzerê
Bengîn jîr 11 serwext bû. di rabûn ti rûniştina xwe de giran û efendî, di 11
.. û bîrbirinê de lezgîn û sivik, di kar ti xebatê de bi înad ti sebat bû, Ew hemû tiştên ku Evdal Ji Temo hêvî dikmn, li nik
106
Bengîn hebûn. Loma, Bengîn j:l Evdal re bû lawê dudiyan. U di warê edeb, terbiye û perwertya Bengîn de. Ji cîhê ku Biro berdabû .
Evdal rahişt ders û şîretan. .Evdal jêre hbas, şa û kirasên nû dan dirûtin. hacetên xwendin Û. nivisînê kirîn. bilûr û tembûreke xweş dan çêkirin û bi destê wî girt. ew bir qonaxê Tahar Xanê. cem mele û mamosteyên zarok û mertvanên Tahar Xanê da ku Bengîn li ber destê wan seyda û mamostan bixwîne û perwerde be.
Bask û perwaz tune bûn ku Be gin pê btûrtya, Bengîn li qonaxê. li. ntk seyda û aliman dest bi xwendinê kir. Bi şadî û kêfxweşî, Wî serê xwe ji xwendm û kitêban ranekir û ji pêgtrtma qelem û pênûsan nava pêçtyên wî êşiyan .. wi Ji sibê heta êvarê dixwend. dinivîsî, digot û guhdarî dikir. Ber bi êvarê. gava ew dihate malê, ji rûniştin û xwendinê navkêlên wî dêşiyan û ji bîrkirina xwarinê zikê wi dikire xu rexu r ~
Gava umrê Bengîn gihîşt çardehan, wekî tava ku nû hûdthat, ew mezin. xweş û çeleng bû Bejna wi dirêj, çavên wi reş. ruyê wî g.eş, eniya wî fireh û vekiri bû. Nêrîna wî nerm û melûl bû Mîna bejna 'WÎ. ruyê WÎ jî. hinekî. dirêj bû. Myangê.n WÎ. poz ... devê \VÎ zirav û dirêj bûn. Simbêl û rih hê. riû, li ser' ruyê WÎ. reş dikirin .. Porê wî yê reş mina qetranê dibiriqî. Gava ew dimeşiya. bejna wî mîna rthana li ber golê, bal dida.
Ji ken. xeberdan, rabûn û rûniştina WÎ dixuya ku xemû keser li ser' serê WÎ çerx dibûn .. Ew bi edeb û terbiye bû û ji biçûkan hez dtkir û rêz û rêzdari Ji mezinan kêm nedikir. Herçend xem. derd e keseran dilê wî êşandtbû .... mina barana biharê JI çavên WÎ hêstir barandiban, ewçend wan .ê alîkarî kiribû ku ew ji xweşiyên dinê hez bike û qedr 'Û qîmet bide
107

wan. Ji lewre, hîs Û pejnên 'ku li ber dilê wi herî bi qîmet bûn. pêlên hezktrtn, xweşî û zanînê bûn. Ew şagirtê zaninê, lawê hînbûnê bû. Bêwest û bêrawest, ew li ser wê riyê bû. Wi dizanîbû; aq:ilê sivik barê giran bû Û mamosteyên wi jê re gotibûn: gava tu zana û têgihîştiyekî dibînî. jê re xizmetkar be.
Belê. gava Bengîn kete çardehan, Evdal hespekî klhêlê bezayî dayê. Te'vI taximekî hij arte yê hespan Evdal ji seracanên Qonaxê rica, kir ku jêre taximekî xemilandî çêkin. Wan di demeke kurt de taxim çêkirin û ew dan Evdal. Taxim bêkusûr bû: bi rengên kesk. sor û zer hatibû şixulandin û xemilandin. Zengû, zexme, rikêb fl hesinê lîwanê hespê mîna 'tîrêjên tavê diçirûsin.
'Weki ku Evdal bîr bt bûyerên bêdib:ir, gava wî taxim da Bengîn, jê re got.
- Bengtno. aqilfahmê mino... Tu niha li zaroktî û xort1yê diqu1ipî û dibî peya. Ez ji Yezdanê pak û dilovan dixwazfm ku serê te bêderd û, bêbe a be. Lê tecrube dfbêjln, çiyayên bilind bê mij nabin, newalên kûr 'bê av nabin û mêrên jîr û çeleng bê derd û kul nabin ... Xwe li hember xirabî, ne rtndt û kirêtiyê hazir bike û ji xweşî û zanînê rû bamede, ji hînbûnê meweste ~ Bila xweşiyên vê dinê. pakiya dilê te û nim û zanîn bibin tîr û mirtalên te, çek û
.- +"""" t
pu sa, Le e
.
Bi dû wê xeberdanê re pir "Wext riebfhtrrî ku derd
û bela 11 pey hev hatln. Herwekî hûn pê dizanin. ava reş bi çave Evdal de 'hat û wan, Evdal. Gulê. Temo, Bengîn û Meyro bajarê rehmetiyê Tahar xanê terk kirin, û xwe h gundan girtin.
Paşê çi bû?
Em ê niha werin ser 'wê dem" wext û dewrê.
108
4
Evîna Meyro Û Bengin
Bengîn û Meyro, her du xweşik, nazikû tenik bûn, mîna du parî şekir bûn. Mîna pelên kulika rengîn a henarê. ew li hev hatibûn. Gava wan, cara

yekemîn hevûdu dîtin, dilê wan li hev keliya û mîna ku ew her tim bi hev re bûne, 'wan dest bi axaf-
tin, lîstik û henekan klr1n. Û wan dest pê kir. bi şev û roj. bi hev re bin. Li malê, 11 çolê, 11 deşt û zozanê, 11 ber av û golê, 11 dawet û dîlanê, 11 xwendegeh û meclîsê. Pir caran Temo jî bi wan re bû û wan her siyan. bi ken, lotik didan xwe û bi derine diçûn û di-
hatin.
Rojekê. gava Tahar Xan ew her du, bi hev re, dîtin. li ber xweştya wan, ew sek.1nî û got,
- Xwedayo ... ev Çi nûra xweşî, masûmi û pakiyê
ye ku li ser rû, cemal û bejna van xort û ciwanan di-biriqe! Nûreke saf ... Xwedayo, vê nûra pak ku li ser TÛyê keç û xortên me ye. JI ser me û welatê me kêm meke.
Kinc û cilên Meyro û Bengîn her gav nû û paqij
bûn. Bengîn her gav kincên spî. Meyro ji fistanên rengîn li xwe dikirin. Ew welê delal bûn ku her
109
daîm li ber çavên merivan bûna, meriv ji dîtina wan têr nedibû.
Şewqa evîn Û hezkirinê zû kete nav dilê wan.
Gava bavê Bengîn Biroyê Dengbêj mir û Evdal û Gulê xwestin ku Bengîn li cem wan bima. hingê Bengîn. bêtir. ji bo Meyro mayin qebûlldr. Hingê dilê wî dest pê kiribû û bi gennahiyeke xweş hildavêt
Lê belê, agirê evînê U gund kete dnê wan. 'Wan terkî bajêr. zengtnt û dewlemendiyên Tahar Xanê kirin û hatin gundekî biçûk, Evdal û Gulê bi h,alê xwe ketibûn. Haya Temo ji JI bayê felekê û dewr û dewranê tune bû. Bengîn û Meyro hîn bêtir nêzîkî
.... - hmsê '-1 d
ev ' u,n u eVIIla wan, ' ~~t pe- ,a.
Belê. hingê. gava umrê Bengîn û Meyro gihişt şanzdeh-hufdan, aqil terka seri da. hiş ji dilê wan rabû, can ji ten bû ... taya evînê ew girtin. Lê ew hewqas masûm bûn ku hê mêşên mê û nêr 11 ser wan veneniştibûn û ew li ber hev rûdiniştin û bêdeng, hi da ê rojan. 11 hev dinihêrîn. Yanî Bengîn destê xwe davêt ber guhê xwe û JI hilatina rojê heta

avaçûna rojê stran digotin û stran û kilam davêtine ser Meyro. Pir caran jî. Bengîn. Meyro. Temo. hi hev re. derd ketin deşt û zozanan. serê çiyan. Carina jî. ew diçûn û 11 gundên doralî digeriyan.
Xelkê xweziya xwe bi wan dianî. didan qise û stran û gotinan.
- Xwedê bi van re be û mlrazê wan bi cîh be. Wan spehîtî û xweşî ji kesi re nehiştine. Awir. rewş û tevgera wan ne mina kesên din e. Halê lêwik halê zana 11 aliman e. AqU taca zêrin e. 11 serê hema kesi nin e. lê li serê vî xortî xwe dlbirtqîne. B~vll. enî. rû. bejn û xeberdana wi. yên leheng û çelengan e. Herçi keçik et ew narin û naz. ara vê dinyayê ye. Gava ew radibe. dipeyive. xwe dlllvine. dikene, pê re dilê
110
xortan bi agir di.şewite.
pêde evîna wan kete devê her kesi û herkes pê hesiya. Agir bi dilê war ketibû û dû jê hildikişiya. Rojekê .
dostekî Evdal hat û bû mêvanê wan ûji Evdal re got,
- Cîhê ku agir lê nayê dadan, dû ji wir hilnakişe.
Xelk behsa Bengîn û Meyro dike, Ne bt xirabî ye. Lê xelk dikare loma bike, ku çima ew bi dîlan. nîşan. şêrtnahi û dawetê aş ke re naldne? Tu dizanî. li welate me. xelk dibêje: her keztzerekê,
simbêlsoreki 11 berê. .
Evdal heq da dostê xwe û bi Gulê şêwirî, Jixwe
Gulê li hêviya roja dawet û şênahtyê bû. Hingê Gulê, bi, 'kêfxweşî. got,
.. Evdalo, mehrûmo ... xwezî te niha btdîta ka çi
peyakî çeleng û keçeke spehîjt Bengîn û Meyro der-ketiye. Bejna Begî. zirav e. mina şitil û tek rihana gol û avê. Awirê wî xweş û delal e. mîna nêrîna teyrê siml û şêrê çiyayê Sîpanê Xelatê. Meyro ye. nazik û nazenîn e, kevoka birc û zozanan e. xwediya çavên belek. guliyê dirêj e. Tu bibînî, ev çi aşq û mihebet e. Ji derdê tira aşq û tnfhebetê aqil
ji serê wan çûye, agir bi dUê wan ketiye De xwe 'bnivîne. ZÛ ke. evîndaran bi hev bigihine.
Wê gavê Evdal hêdi hêdî bi simbêlê xwe 1îst û bi Gulê keniya. Gotina heval. dost û Gulê û xeberên rind 'û pîroz, dilê wî xweş kiribû. Ew ji li

benda wê rojê bû û Ji mêj ve. wî di serê xwe de, ji bo roja pîroz stranek çêk1r1bû. wi 1 kêfxweşî, dest bi strana xwe
kir.
Ez fm. Evdal fm
Wextekê Evdalê Zeynikê bûm, xortekî çarde salî bûm,
St.warê cantyeke sê salî bûm
Li clûvanên hakim û mîran. beg û beg,leran bûm
111
Dengbêjekî serekê dengbêJWl bûm. Berdûkê qizari û bûkan. bûm,
Iro kor bume. Jt, dinyayê bi dûr ketime,
Lê, bi siûda rindî Dengin û Meyro dikenime,
- al bikin' biri """
w e m .. a m,e şa .' emnneti me
btkeuiintne. ..
Bi vî awayî, Evdal û Gulê Bengîn û Meyro kirin destgirtî û kincên nû li wan kirin û ji çavên wan maç kirin. Şeveke xweş a havînê, ew li meydana gund civiyan û şêrînahiya Bengîn û Meyro xwarin. Gelek heval û dostên Evdal jî hatibûn. Wan û şagtrtên Evdal heta sibê stran gotin. govend girtin Û qesta felekê kirin. Temo jî. 11 kêleka bavê xwe rûnişt û heta sibê 11 çepikan xist.
Ji kêfa wan re payan tune 'bû.
Lê belê. xwendevanên ezîz, hûn ji serpêhatiyên qehremanê çîroka me Evdal diza in: dinya gewrik e, pûç û betal e. kewna namerd û xiraban e, ew li pey kesî nayê. Di wan wextên şên û şênahtyê de, dinya misûbet û, feleka kambax, dîsan, kumê xwe xwar
iri û çerxa xwe zivirandin. Niha jî feleka kambax E,gid Begê û, lawê \VÎ çeto derxistibûn ser riya Bengîn û Meyro û herweha ser riya Evdal û Gulê ...
Hûn ê, niha, bipirsin ka Egîd Begê û lawê wî çeto kî bûn ... Wey lê felekê. zalimê ... Belê, bi dû sirgûni û malwêraniya Tahar Xanê re, Egîd Begê hebû, pismamê Tahar Kanê, dostê paşayê dewleta, Osmanî Ali Kor Reşîd Paşa. xwediyê bi dehan jin û cartyên
kef li devê. dijminê bextê çê û neyarê welatevîntyê ...

. Ciroka Egîd Begê dirêj e. Lê me dil tune ku em çtroke dirêj bikin û serê we pê bêştntn. Loma em ê,
bi kurtî. behsa Egîd .Begê malmîrat bikin da ku em disan vegerin û bên cem Bengîn û Meyro.
112
E
5
Egid Begê .
.
.
-....-,
Berî niha bi bîskekê. me qala Tahar Xanê qedirbfltnd, nefîbûna wî û wefata, wî kir. Niha jî em ê
qise û gotinê bînin ser erd. avahî û welatê 'WÎ û binihêrin ka pişt- Tahar xanê. çi pê qewimî
Hezar mixabin, ê Tahar xan çavvekiri çû gorê.
Li we atê xerîbiyê û bê şîn û taziye. Avahiyên ku wî dest pê kiribûn, nîvçe man û daxwaz û armancên 'WÎ, qurmtçîn. Ew bê şîn çû rehmetê. le belê; welêt şîna xwe girêda. Osmaniyan nedtxwestln welat di nav rehetî. sulh û aşitiyê de 'he. Pala Osman û Kor Reşîd Paşayê bêbext welat şewitandin. U' Kor Reşîd Paşa. qtsas û dijminê Tahar Xanê, war û welatê Tahar Xanê kir wêran. wî kitabxana Tahar Xanê vala kir, hemû kitêb. ewraq û kaxizên 'tê det şandin Stembolê. medresa, qonaxê da, girtin û alîm û seyda û zana belav kirin û çend hebên wan xistin bin qeyd û zinctran 'û avêtin zîndanan. wi zana. aqilmend ~ kumandarên Tahar xanê belav kirin, hin bi Tahar Xane re şandin welate xeribiyê, hin kuştin 'û, hin javêtin zîndanan 11 şandin deverine dûr.
U KOr Reşîd, Paşayê xwînrêj Egîd Beg ji xiste
:11,3
dewsa Tahar Xanê Û ew mîr îlan kir ~ Herçî Egîd, Begê bû, merivekî zikreş, çavbirçî. jlxwerazî, xayin, sextekar, zalim û hîlebaz bû. Wî. ji mêj ve. dijminatî li Tahar Xanê dikir û, digel ku, ew meriv û pismamê Tahar Xanê

bû, dek û, dolab li dora, Tahar Xanê digerand û alikarî li fêlbazî 'û, sextekariyên Osmaniyan dikir. Navê wî bi stxurî deng dabû û xelkê digot, - Egîd Begê ye, karê 'wî navkokî û fetbazî 'ye. Agir bi mala wî keve. Ew kewê 11 ber destê nêçirvan e. Nêçirvan, pê dere nêçîrê û qewmê wî dikuje. Kewe. neyarê qewmê xwe ye. Dinya hemû neyarê kew et kewjî neyarê qewmê xwe ye t Siya '\VÎ her daîm ber bi aliyê Osmaniyan e û darê di ser xwe re dibire . Ew mel'ûn e, gorê lê teng be.
Merivekî weha xirab û nezan li, qesr 'û, qonaxa, Tahar Xanê rûnişt û, dest bi ,hukim kir, Bi rêdan û
şîretên Osmaniyan. wî siyaseta Tahar Xanê k'u li ser hukmekî adîlane, şuxil û gerandina aşîtî û dos-
tane ava bûbû. hilweşand û eşîr bera hev dan. eskerên Osmanî xistin her derî, ceza û, bac zêde kirin û bira bi bira kire dijmin... û ew 11 dijî kes û xelkên nemuslîm ji bi kîn, 'rik û nefreteke bêpayan rabû.
Wî hebûn û dewlemendiya xwe ya şexsî bêhed û bêstnor, zêde kir. Zikbirçî têr dibin, ê belê çavbirçî têr nabin, .. Egîd Begê jî merivekî çavbirçî bû. Kê ç.i btdayê, wi werdigirt 'û, çi bt dest ketayê, wî nedigot na, Ew merivekî' hesûd, pexil û zikreş bû, wî dikir?
nedikir? kesî bi rindî behsa wî ned1ldr û qedr û qîmet nedidayê. Vê yekê ew hîn bêtir :har dikir wi gisnê ku di çavê wi de bû nedidn, ê belê, derziya hûr di çavê der û dora, xwe. şênî û xelkê de didit. Loma, wi dijminatiye'ke bêhudûd 11 dost, heval. 'nas 'û hezkerên Tahar Xanê dikir. Ew û Osmanî, bi hev re,
bûbûn yek û, dtxwestm navê merivên çê û qenc û
114
tiştên ku navê wan bi bîr dianî, ji meydana dinê rakin. Ji bo vê yekê, wî her dek û dolab digerand û
daf dadanî.
Berî bûyeran bi çend sa an, Evdal ji warê şer û
bûyeran bi dûr ketibû û xwe sparUbû gundan. Eger welê nebûya. Egîd Beg ê dek û dolab 11 serê Evdal jî bigeranda. wî Evdal jibîr nekiribû û li benda fersendê bû, ~ ~ Kirin 'û kirêtiyên Egîd Begê dihatin guhê Evdal.

Ew li ber bûyeran, serpêhatiya Tahar Xanê û qedera xirab diket û stran davêtme ser wan Wî Egîd Begê baş dinasî Û digot
.. Gava rûn li cem şîrheraman pir be, ez nizanim,
ew 11 çiyê xwe d din ...
Ew fersenda ku Egîd Beg li pey bû t Iawê wî çeto, bi nezanî, da Egîd Begê. Ew çawan bû?. Ev bûyera nexweş ku kete nav çîrok û destanan û dilê her kesî pê êşiya, ne ya gotinê ye. Lê. em ê çavê xwe mij kin û bi gotinên xwe yên nebiha,j we re, bi kurtî bibêjin.
çeto lawekî nerm û qenc bû. Ew' di umrê Bengîn û Meyro de bû û gava Bengîn û Meyro li bajêr bûn, çeto hevalê wan bû û wan bi hev re dixwendin. çeto li bavê xwe neçûbû. Tahar Xanê ji jê hez dikir û, ew di medresa Qonaxê de dida xwendin. Lîstik. xwendin û hevaltiya çeto bi Bengîn û Meyro re xweş bû. Ew hê zarok bûn. lê di wê demê de. bala çeto 'li ser Meyro bû û qedr û qîmet didayê, xwe dida ber bayê
;il;,.
we'
- ..
Peyva kalemêr û pîrejinan tev cewher in" meriv
divê wan navêje bin lingan. Wan gotiye: giya di bin keviran de namîne. hêşîn dibe.
Ew bal û nêrîn û mthebeta çeto. rojekê, bû belayê serê çeto. Bengîn û M,eyro. Haya Cetoyê reben ji tiştekî nîn bû. Çend sal bi dû barkirina Evdal wan, rojekê Çeto, tevî çend hevalên xwe. hate gundê ku Evdal wan tê de dijiyan. Hingê bavê çeto bûbû huldmdar û ji pozê xwe mû nedibirî. Lê. awir û
115
tevgera Egîd Begê qet ne bi dilê çeto bû û ew Jê ne razî bû. çeto û hevalên wî diçûn seyda xezalan û li ser riya. xwe, çeto xwestibû seri bide Evdal 'Û Gulê û
hevalên XW'e yên zarotiyê. JI navberê gelek sal derbas bûbûn, Ew guherîbûn
Û. mezin bûbûn. Ew

bûbûn xort û dilê wan bi xurtî hlldavêt. Meyro bûbû xezaleke zozanan û çavên wê yên belek meriv sersem dikir, bedena wê heş ji serê meriv dibir, gotinên wê yên xweş meriv mat dikir. Hingê, 11 wir, ew hîsên çeto yên zarotiya wî, ji nû ve, vejîn. Niha hin xurttir, kûrtir û bedewtir. Lê, ew ne kesê xeberdana. hîs û daxwazan bû, wî şerm dikir. Loma. hingê wi tiştekî negot û hisên. xwe bi dernedan,
çeto û hevalên wî, bi tenê, du roj 11 nik Evdal, Gulê. Temo. Bengîn û Meyro man. BI dû du rojan re, wan JI haziriyan xatir xwestin û li ser riya. xwe ber .. dewam bûn. Her çiqas Bengîn û Meyro xwestin ku ew çend rojên. din jî bimana .
lê ew neman û çûn. D.tgel vê. çeto soz da ku ew disan vegere û li cem wan demeke dirêj bimîne.
Mixabin. çeto hew vegeriya gund. Em dibêjin mixabin. ji ber ku eger ew bi xwe vegeriya gund. heye ku ew bûyerên kambax neqew1m1yana. Belê ew bi xwe venegeriya gun.d, lê wî mamoste xwe, du beg û du rihspî şandin gund. TIra evînê di dilê wi de çtklyabû. Ew birîndar bû. Bt qast du mehan. ew 11 seydê ma û bi dû re vegeriya bajêr. Ew bi carekê guherîbû t heşê 'wi 'ne 11 ser hazir û civatê, bala wi ne
11 ser qise û gotinan bû. Mîna ku ew çûbû dinyayeke din. Ew di nav xem û xeyalan de dijiya û ji xwarin û vexwarinê hatibu birîn. Tevgera. wi sist bûbû û rengê rûyê wî qul1pîbû rengê xweliyê û çavên wî ketibûn kortê,
Heşê wi li cem Meyro bil. Meyro bûbû nan. û ava wî. roj û şeva wî, Dinê hemû li ber çavên wî winda.
116
bûbû. bi tenê, 'Meyro mabû. Xewa. şevan jê re heram bûbû. Lê wî ntkarîbû deriyê dilê xwe vekira û derdê
xwe ji kesekî re bigota. Carekê. du caran wî xwest qutiya dflê xwe veke. lê zimanê wi negeriya. ji şerm Û fediyan xwîdan bi canê wî ket û deng jê nehat. Lê mamostê wî yê nim û felsefê bi derdê wî hesiya û ji rabûn û rûniştina wî derxist ku birîna çeto birina dilan bû. Rojekê, mamoste çeto xewle kir, qise ani ser q1Sê û jê re got,
- Çetoyê b'aqil, kesê ku derdê xwe nebêje, nikare derman Jî bibîne. Halê te ne tu hal e. Tu JI ber birîna evîneke yeman dinalî. Ez1yetê 11 xwe meke.

U tu dizanît dermanê bixwekiriyan tune lt De were, tu derdê xwe JI mamostê xwe re bibêje. Derdê te, derdê min e.
Mamoste. bi vî awayi, xe berdan dirêj kir heta ku çeto jê re vebû û xwe avête bextê wi û derdê xwe, digel her kit-kitê, jê re got. çeto nedixwest ku kes pê bizanibe. 'U haya bavê wî qet jê nebe. Mamoste soz dayê û jê re bi telaqê jina xwe sond xwar ku Ji kesî re nebêje. Di dawiya gotinên xwe de. wî hin tişt li ber guhê çeto xistin û jê re gote.
- Çetoyê efendî û hurmetkar, derdê te ne derdekî bêçare ye. Ez ji derdekî hîn xirabtir ditirsîm. Keçik ciwan e û li ber zewacê ye, Eger tu bi, ya min, biki. em ê herin û keçikê ji te re bixwazin. Ma ew ê ji te çêtir bibînin? Xelkê gotiye. dilê tirseke sînga gewr' nabîne. Ji xwestinê xweştir 'û maqûltir tu tişt nîn
1. ~. li serê bifikire.
çeto nedixwest gaveke şaş bavêje û hinan pê biêşîne û eciz bike. Lê 11 milê dtn jt, dU û canê wi bt pêlên evînê radibû û heş ji, serî diç'" , Wî gotinên
mamostê xwe, b caran û bi mehan, rakir û dani û paşê biryara xwe da û îcar. bi xwe, xwe li mamostê xwe girt ûjê re got.
117
- Mamostê min ê ezîz, min dilê xwe ji te re vekir û derdê xwe got, Agirê evînê zor 11 min bir. Ootlna te rast e, rêbtrîn bi gavavêtmê dibe. Eger bi dilê te be. ez dixwazim ku tu çêy1yekê bi min bikî.
Herweha mamoste, du beg û du kalemêrên kurd" bi hev re. çûn gund, 'û, bûn mêvanê Evdal. Evdall1 şagirt. ders û stranên xwe hûr dibû û Bengîn jî alîkarî lê dikir. Karê Evdal pir bû. Ji ber ku şagirt ji her ali dihatin. Aşkere 'bû, ku hatina koma, mezinan ne bêsebeb bû. Evdal û Gulê mêvanên xwe ezimandin 'û di. qedr û qîmet! de kêmanî Û qusûr nektrtn,
Sê roj, ji hal û hewalên wan, rewş û tevgera dinê pe ve. Evdal tu tişt ji wan neptrst, Bi dû sê rojan re, piştî ştva êvarê. vexwarina qahwê
. Evdal balgiha pişta xwe rast , çoga xwe danî ber çog, dest bi qisan kir û riya qotin û, daxwazan vekir.

.. Mevai ên mtn ên ezîz û qedirgiran, hûn, dizanin. li ba me u dan, heqê mêvaniyê sê roj e. Ji sê rojan bi şûn de. mêvan jî dibe xwediyê malê û daxwaz û gotina xwe dtbêje.
Lê belê, daxwaz û gottna mêvanan Evdal pir û pir êşand. Ew û Gulê bi Bengîn û Gulê re peytvîbûn ku gava ew dawet ... dîlanê li dar xînin. ew divê çeto JI
vexwînin. Lê niha Ceto hi daxwazeke din hatibû meydanê, Dilê Evd,a, em bi çeto. hem bi Bengîn û Meyro êşiya, Evdal bang li Gulê kir 'û ew ji aliyê din ê malê da anîn û mesele jê re jî got. Lê çare nîn bû. daxwaz xweş bû, lê bicîhanîn bêîmkan bû. Evdal û
Gulê bi mêvanên xwe dan zanin ku Meyro bi Bengîn re destgirtî bû, qewl û qehnê wan hatibû birin û ew 11 ber deriyê zewacê bûn, li evîna wan, evîneke yekane bû. Wan, hêvî kirîn ku çeto zêde li ber vê yekê nekeve, JI ber ku ew jî. j bo wan, mîna Temo û Bengfn bû.
Lê, em divê li vê derê bibêjin ku gotinên Evdal û
.1,18
Gulê ji bo dtlgtrtmê bû Û gotinên xav bûn, Gotinên xav jî nedlpiJîn 11 'ber' tav.; çeto pir li ber wê xebera ku mamoste jêre anîbû 'û 11 ber kmna xwe ket. Gava wî xeber bihîst, ew ji xwîn miçiqî Û bû weki meyttan. Eger yeki. hingê. xençerek li ser dilê wî xista, xwîn ê jê neçûya, Wi. bi hêdîka. serê xwe xiste
nav destên xwe û bi tenê got.
- Heywax... te dît, min çi kir.
Mamostê wî li ber wî geriya. b dirêJah.iya danên rojê. got li peyivî, lê çeto tiştekî nebihîst. wî deriyê dilê xwe, b: carekê, girt û hew vekir û destara dilê X\Ve hew' gerand.
çeto. 'bi tenê. daxwazekji mamostê xwe hebû; tu kes diviya bi hedîsê nlzanîbûya 'û eman, eman, bavê \VÎ. Egîd Begê bi tiştekî, nehe stya. [Ji ber ku wî dizanibû ka 'bavê wî çi kelp bû ... 'Dinya 11 ber çavê çeto reş bû û 1 ser serê wî hilweşiya. WI hêstirên bêdeng 11 ser çavan barandin, axîn û nalîn ji dil û kezeb ktşandm. Birina çeto niha kûrtir bû. Lt milekî, agirê aşqê bû ku ,jê bi dûr nediket û wî nikarîbû rê lê bigirta û li, milekî jî, fedt Û şerma wî 'bû wî îş xirab kiribû û hîmê hevaltt û dostlya xwe û Bengîn û

Meyro j' dewsê leqandtbû. Wan 'û Evd,al û Gulê de, niha. bi ç:i çavî lê binihêrtya?. Wi hêdî hêdî xwe Ji allem û dinê da ali ûete nav xem" êş, derd û keseran heta ku rojekê, bi dû buyerê re bi qasî salekê, di seyd û nêçîra xezalan de. li ser hespê xwe, ew ji kaşekî ket bin bfhurekê û can da", çû rehmetê.
Kesi fahm nekir ka ew 'tişt çawan qewimî.
Hinan gotin, "qeza ye. ft Hinan Ji gotm, "na, ne qeza, ye. wî bi xwe kir "Il xwe avêt." Herkesî fahm, k1r1bC1 ku Çeto b:l tiştine pir dêştya, lê mzambûn, bi çi. Dê. bira, heval û hogirên wî kirIn, nekirin. nikaribûn jê fahm bildr1na. Niha ji~ ew bi sirê xwe çûbû diyarê
119
rehmetê.
. Xebera mmna çeto. Evdal, Gulê, Bengîn û Meyro .gêj û sersem kir. Wan tiştekî weha kam b ax. ned.ipan. Wan meraq li.
çeto dikir û ji na-s û hevalan halê wî dtptrstn. Heta Bengtn carekê. du caran xeber jî şandê ku ew were cem wan û çendekê bimîne, Bi vî awayî. wan dixwest dilê çeto bigtrtn. Lê xeber ji çeto derneket. dewsa. xebera wi, xebera mirina. wî hat .. Bi dû mtrtna Ceto re mehekê. xeber bi wan gihişt. D.igel ku êdî dereng bû, Bengtn xwest.
Ji bo sersaxî û taztyê, here cem dê
Û birayên çeto. wi hespê xwe hazir kir. taxim avête serê. lê siwar bû 'û berê xwe da bajêr.
Xwezî wî weha nekira û herê xwe eda bajêr.
Xwezî qinorên xedar 11 çîpên hespê derbûna û hespê xwe :negîhanda bajêr. Lê xwezî di gewriyê de dibe xezî Bengîn xwe hi baj êr giha d, çû cem. dê û birayên çeto, sersaxî 11 wa kir. Ew 11 bajêr. li xanekê, çend rojan. ma. tiştine ji bo Evdal, Gu ê. Meyro û Temo kirîn û paşe. disan. 11 hespê xwe siwar bû
û bê hay û tam. vegeriya malê. Lê belê, qiyamet hingê rabû, topa qise. gotin û laqirdiyan teqiya. û deng da. Mesela çeto. Bengîn û Meyro hingê kete devê xelkê û li baJ êr geriya. Ev .. eber j1 devê kê derketin, kê ew belav kirtn? Kesi bi vê yeki nizanîbû, lê çav m~ bûn, guh vebûn û dev liviyan û gotin,

- Heyra. sebebê mirina çeto Meyro ye. çeto alîm û zana û .giregir şandine cem Evdalê Zeynikê da ku keça wî Meyro Jê re btxwazine. Wan keç nedaye çeto û keçikê çeto nexwestiye û elçî bi şûn de vegerine. Ma derd û kulên çeto eger ne ev bûne. hingê çi bûne?
Hûn dizanin, gava xebereke xirab derdikeve, feleka bêbavê kefa xwe pê tine, govendê girêdide û li xeberê zêde dike 11 xeberê b.i her dert digihîne. Hingê
120
jî welê bû; xeber bi Egîd Begê malmtrat jî gihîşte ...
Ma kesî dîtiye ku bar çûye ber kerê? Naxwe ker nare ber barê? Lê îcar bar çû ber kerê 'Egîd Begê dixwest çavek, Xwedê danê du çav. Borîn pê ket. dû û dûmana hîddetêjê rabû, taya kin û nefretê ew girt û kire qîreqîr û guregur. Fersenda ku ew li peyê bû, niha ketibû destê WÎ. wi çavên xwe girtin û devê xwe vekir û, da qise û gotin, çêr û xeberan.
- Naxwe, qesasê lawê min ew Evdalê kor e? Ew korê pîsê heram çawan dikare lawê min bişkîne û gotina wî bide bin lingan? Çawan ew dêlika kafir diwêre bibêje na û bide bersîvan? Ma ew nizanin ku ez Egîd Beg im, hakimê dewr - dewran, dostê Osma ntyan, xwediyê şêr û pilingan? Ma ew nizanin, ez ê
ê dê ik- - a e "., ê k dê kil ....
we uenxe u mer we y - "un" eser tav an u ew
kesên ku alîkarî li wan bikine. têxJm heft qat hinê
erdê û dinyayê li wan bik1me heram?., Lawo, kumandar û stwartnol.. rOJ ne roja qise û, gotinan e. Hemam bi tir û ûsan germ nabe. Xwe bilivtntne, btlezînine t xwe 'bi gundê Evdalê kor bigtrtne û wê dêlika filebavê û segê mêrê 'wê bi min higihîn1ne ...
Gava siwarên Egid Begê hatin gund. haya kesî ji tiştekî nîn bû. Wan rojên xwe yen wekane, bi xirecira rojane, derbas dikirin. Bengîn û Meyro zewtcîbûrr. Evdal gotibu, "êdî roj hate, ez ê Tavbanûyê b1kime bûk û Bengîn bik1me zava" û wan ew zew1candibûn. Wan daweteke biçûk 11 dar xistibûn, Evdal stran go"tibûn" Gulê serkêşiya govendê kiribû û rojên xwe yên bihurî bi şûn de am"bû, Bengîn û Meyro, mU bi mû, govend girtibûn,

dengbêj û stranvanên din bi lec û şerê kUam û stranan rabûbûn û Temo ji. digel ku kesi Jê tiştekî fahm nekirfbû, destê xwe avêtibû ber guhê xwe û di Jiyana :xwe de cara yekemîn. stranek gotibû. U heta ku siwar hatin, roj. wext û dewr. bi awayeki aram û
121
' b .... b _... .A. b ,;t." ~' eroas ou uu çu .U,.
Siwar hatibûn ku Bengîn û Meyro bi xwe re bibin cem Egîd Begê. Ev'xeber hema 11 doran û welêt belav bû û beg û giregirên doralî xwe bi gund gihandin. Herkesî dizanîbû ku eger Bengîn û Meyro bi stwaran re herin, êdî ew hew vedigerin. Ev çi tişt hû bi serê wan de hatibû?. Beg û giregir ketin navberê û bernedan ku siwar Bengîn û Meyro bidin ber xwe û bi xwe re bibin, Bi tika û mînet û ltbergerîn û Iave, siwar bi vê yekê qayil bûn. Lê. bi şertekî ku heyetekê ji beg û giregiran jî, bi wan re, bihata û hal û hewalê bi Egîd Begê bida zanin. Jixwe daxwaza dilê Evdal ji ev bû ku çend xwedîqedir û xwedîsoz biçûna û bi Egîd Begê mel'un re bipeyivty-ana. Hebû ku dilê Egîd Begê hinekî rierm bûya. Bi vî awayi, heyeta beg û giregiran jî tevî siwarên Egîd Begê, bi, rê ketin û çûn, Gava Evdal ew bi rê ktrm, wî spasî 11 wan, ktr û got.
MP Ji Xwedê hêvî nayê birîn. Bi merivên serwext û xeberdana :nenn mar ji qulê tê der.
Lê mar ne mar bi xwe bu, merivekî mîna Egîd Begê ketibû dewsa mar. Beg û gtregtr çûn û derketin meclisa Egîd Begê û pê re peyivîn û gotin,
- Eg-d Beg, tu merIveki mezin û giran î Em elçi ne û elçt bêzewal e. Em hatine û xwe davêjine bextê te. Kirin û tevgera Bengin û Meyro bêsûc û bêgune ye. Hê di zarotiyê de. ew evîndar û dildarên hev bûne. Haya çeto ji şêrînahiya wan. haya wan ji taya evîna çeto rûn bûye, Ew' Jî~ bi qasî me û te, 11 ber çeto û m1r1na wî dikevine û xwîn digirine ... Egîd Beg ew sêwî. bêes û bêçare ne. Ew xwe davêjine ber bextê te.. Her welateki xwediyê adet û ûsilan e. Kes divê van adet û ûsilan nelivine - ne eqîne. LI welatê me kurdan adet ûsll e. kes dest .. kalemêr, pirejin.
btrtndar, zarok, jinebî. keti 11 sêwiyan ranake. Hele
122
s

a
k
î
n
d
e
r
b
li evîndar û. dilketiyan qet ranake I Li welatê me adet et gava meriv du maran bibîne ku li hev piçlk.tyane û bi qesta kêf û henekan rabûne. meriv wan dihewtne, rûyê xwe ba dide û dere. Egîd Begê. tu mezin Û. xwedî desthilat Î. Efû. û lêbthurin karê mêran û mezinan e~ Bengînt Meyro bêsuc 'Û bêgune ne. Eger kêmanî û qusûrekî wan jî hebe, çavê xwe lê bigire. bide bin lingan û ji wan bigere. Heçî Evdalê zeynikê ye, JI çavan bûye, merivekî kokim e, xtrabiya wî bi kesî negihîştiye û bi dengê xwe mala me, welatê m
e şên. kiriye. .
Lê bele, ew xeberdan bêfeyde bû Begû giregirên kurdan çijî gotin, nikarîbûn Egîd Beg nerm bfktrtna. Dtlê Egîd Begê ne dtl, lê kevir bû. Ew ji kera xwe peya 'nedibû û. qîreqtr dikir û digot
.. Na. nabe. lawê min ê mîna çiya ji bo dêl1kekê bimire û ez xwe kerr b1kim.e û çavên xwe bigirim û nekevim pey tol û heyfa lawê xwe! Na, nabe, weha nabe. Çawan devê we digere û. hûn dibêjin ku ew masûm û bêgune ne? Çawan hûn bi jtnan û qisên wan bawer dibine? Ew dêlik in û dêla WCID ber bi jor e. Ma heta dêl1k dêla xwe nelivine 'Û xwe b:i bîhna segê no negire. kes dikare seg bi ser dêlikê berde? Jin Jin e, parsûya kêm. rûreşlya mal û civatan e. Ew sebebê qise 'û serhevdan e, bi teşiya xwe, jin sebebê lec û peveçûnan e .. Gotina we li ser seran
1. çavan e, lê ez tu cariji gotina xwe danakevime û xwîna lawê xwe 11 erdê nahêlime Hûn dizanin, herçî ew kesê ku negot û ktr, şêr e: yê got .. kir mêr e: yê got

Û. nekir, keremêr e. Min carekê gotina xwe gotiye, ew dêlika meha û mêrê wê yê kûç k ê werin û ceza xwe bibtnme.,; Ma ez keremêr im ku tiştekî bfbêm û nekime?.
Gotina dirêj bêkêr bû. Begeld ji heyetê hema stwarekî bi rê xist, xeber şande Evdal û Beng'm û got,
- Keremêrekî mîna vî Egîd Begê hê nehatiye TÛyê dinê. Qise nakevine seri. ew bûye mina kevirê goristanê. Bila Bengîn û Meyro xwe bidine alî, Ji ber çavan 'Winda bibin. hê ku Egîd, Begê malmîrat gund nekiriye gola xwînê.
Bi gihîştina xeberê. lt gund, lez û, bezekê dest pê kir. Evdal. Gulê Bengîn, Meyro, gundî. şagirt. dost û heval 11 hev civiyan. dan muhawele, şîret, rê û çareyan. Çi hebûn li 'ber dest û îmkanan? Bengîn 'û Meyro dê biçûna ber bi kîj an cîh û deveran? Lê tiştekî bi misogerî bûbû beyan; Bengîn û Meyro hew' dikaribûn li g g û doralî bijlyan û diviya ew winda bibûna ji ber rû 'û, çavan,
... Em çawan bikin? Qed,era, 'me jî weha ye, Il me xirab h,at'iye. Evdal j Bengîn û Meyro 're got û domand, li van deran jiyan. xweşî û bextiyarî li we heram e. Ji destê me pir tişt nayine. Kurmê darê ji darê nebe. zewala darê nm e. Lê, kumê felekê li ser me xwar e. Egîd Begê k ' rmê me ye ... De btlezîntne da ku hûn nebine kewên dafên malxirabê :Egîd, Begê û riyên dûr bidme ber xwe .. ji vir heri ea
Lê ber bi kû? Wê şevê. Evdal bersiva vê yekê j"peyda kir. Evdal bang li Bengîn û Meyro kir, ew' lt ber çoga xwe dan rûnişttn, bi her destekî xwe. destê wan girt. bi qasî bîhnekê bêdeng ma A paşê hêdî hêdi got,
- Tavbanûyê, delalê ... Be ngtno, çelengo ... keç û lawê min ên srûdreştno. ~ I Dilê min dibê, riya, studa
we ber bi çiyayê Şenga,lê, cem dostên 'min ên êzidiyan e. Ew der asê ye, warê teyrên eylo û bazan, direndeyên şêr û pilingan e Merivên wê derê mêvanperwer û merivên yekane ne Ew ji dostên xwe re dost, ji dyminê xwe re dijmin, li dijminê doste xwe dijminên yekta ne. Ew bi, sifra xwe dewlemend. bi dilê X\Ve nerm, bi qewlê xwe zexm. bi
124

mêraniya xwe navdar. bi dînê xwe perwer, bi şerê xwe asê ne ... Bêyi teyr û rawtran, kes nikare, zû bi zû, xwe bi wan deran bigihîne. Meger ku hinekan xwe bi wan deran gîhand. heta ew xwe li ber we nedine kuştin, ew we bi derekî de nahêltne ... Sibê zû. gava ro hê hilnehatiye, hûn divê bi rê kevine. Blla agir bi mala Egîd Begê keve ... îşev. 11 vir, şeva
we ya dawin e.
Ma ji destê Bengîn û Meyro çi dihat? Wan ê, bi alîkariya Evdal, girêka xwe. bi destê xwe. veldrtna. Go't1nê,n Evdal kete beşê' wan, û Gulê, Wê şevê xew' neket çavê kesi Mala Evdal tiji meriv bû. Ew heta ber destê sibê rûniştin, li ser hal û hewalên welêt, kmnên Osmaniyan û Egîd Begê û rewşa Bengîn û
Meyro peyivîn. Serê sibê, gava ro hê derneketibû, hesp ji tewlan derketin û haziriya çûyin û rêwîtiyê dest pê kir Çend kes ji gundî, şagirt û dostên Evdal
j- dê bi wan re biçûna,
Berî ku ew b rê kevin. Meyro, Bengîn xewle kir. ew bir hundir, b gtrt, ew hembêz kir il ramûsî. Bengîn jî delala xwe, pihêt, hembêz kir. Bt qasî btstekê, ew welêt bêdeng, man, Paşê Meyro. bi
hêdîka, J'ê re got,
- Bengîn. he alê min ... Tu mêrê min û hevalê
min ê qederê yî. Axlrdewran jî were. qiyamet jî rabe. tu peyayê ber dilê min 1. Riya me dûr, pêşiya me kûr e Ez dixwaZim ku tu b:i hilavêttna dilê min
bfzarnbî; bt dû te re. her tiştê xweş. her tevgerê geş 11 min heram e. Kinc û ÎlStanên dezi û hewreştml, şehk1r1na porê bt kezî, k1ldana çav û btrû, xwarina
girara bi tawaş û nanê b . xwê, xewa 11 ser text û ey-wanan, rabûn, û 'rûniştina nav heval û dostan. govenda dîlan û dawetan û mehr û zewaca mêran ê 11 min heram be.
Lt ser van gotinan, Bengîn. çend car li ser hev,
12,5
Meyro ramûsa û bi dû re. serê wê rakir û 11 çavên wê yên belek nihêrî û her du çavên wê maç kirin û bi tenê ev peyv ji devê WÎ derketin,

- Li min jî ...
Hingê ro li taştiyan bû. Wexta çûyinê hatibû. Ji zarokan pê ve tu kes ranezabû û herkes 11 meydana gund bû. Siwaran hesp anîbûn meydanê Taximê hespê k1hêlê bezayî, zîn û zengû 11 serê bûn. Bengîn û Meyro Ji haziran xatir xwestin û ew, yek bi yek. hembêz kirin û destê mezinan ramûsîn. Wan xwe avêtin hembêz û destê Evdal û Gulê jî. Hingê Gulê, bi gtrtneke kezebxur, da t1liUyan. Jinên din ên meydanê deng dan Gulê û wan ji dest bi t1l0iyê kir. Evdal ji dengê xwe bllind kir
şagirtan Jî bi Evdal re, deng bilind kir. Di nav tilm. deng û stranê de. Bengîn hesp kişand ber kevirê slwarbûnê û Meyro lê siwar kir û paşê, bi xwe jî, ê siwar bû. Bengîn û Meyro b sê dengan, dîsan. ji gund xatir xwestin û berê xwe dan çiyayê Şengalê. başûrê Kurdistanê.
Gelî guhdar û xwendevanan, em ê jî, mha, bidin pey wan û bi Bengîn û Meyro re herin û bib- in çi hi wan .dtqewtme.
126
8 Rêw1ndayên Sêw!
Kerwana Irra,ran ber bi çiyayê Şengalê. warê êzidiyan bi rê ket û bi rêwîtiyeke bi qasî panzdeh rojan. gihîşt çiyayê asê. Şengal warekî çetin, zehmet. asê ûji dinê bi dûr bû. Der û dor hemû çiya û zinarên btlmd, gelî û newalên kûr bûn. Her der şmahî, kahnî û, av bû, Teyr û tilûr', raw1r û heywan
pir bûn. lê meriv kêm bûn. Şengal cihekî aram. lê bi xof 'û, her tim bi mij û dûman bû.
Xelkê \VÎ deverî kurd bûn, lê ne misilman bûn.
Ew êzîdî bûn, law û keçên çiyayê asê. şêr û pilingên tebietê. Ol û dînê wan kevnare bû. ji kûrahiyên tarîxa, dûr hatibû. Wan xwe wekî neviyên Zerde'şt pêxember. law û keçên bijarte yên Rebbê A11emê didîtin. Ji lewre. ew bi hevaltî. peywendî, rabûn û runiştina xwe nefsbiçûk. bi fikirîn. baweri, raman û evîna xwe mezin û maxrûr bû . Mesela wan li ser xwe û misilmanan weha digotin,
Herçi mtsUman man û man Herçi êz ldi' ne,
CUspi ne
Henlu ceneti 'ne

127
Belê t cil. kinc û libasên wan spî bûn û ew nîşana paqijî û rindiya wan bû. Di bawerî, rê û qay1dên 01 û dînê êzidiyan det şop, ders û şîretên Zerdeşt. Musa
Isa û MJhemed pêxemberan hebûn.
Ola êzidiyan pir kevnare bû, lê ew bê, xwendin û ntvtsin, pênûs û defter bû. Ji lewre, wê li ser riya tarîxê. ji eslê xwe. pir tişt winda kiribû û gelek tiştên din ketibûne navê. Kitêbeke wan a dîn- û esasî nîn bû, lê gelek telqîn û qewlên wan ên niviskî hebûn. Ezidî koçerên vê dinyayê. mêvanên axretê bûn. Her gava ku kel I dinê radibû û dinya dlçelqiya, agir li serê êzidiyan jî dibarî. Herkes li wan dihate xezebê. Ew bêkes û bêptşt bûn û ji gerîna dinê û çerxa felekêa m nedikIrin. Doraliyê wan bi agir pêçayî bû. Ew di av behra misilmanan de giraveke biçûk a kevnare bûn, Tirk. ereb, ecem, kurdên mtsilma û ermen bi dijminahî li wan dinihêrîn û şûrê xwe li ser serê wan htldidan. U' gava fersend dikete destê wan. bi darê zorê û şûrê xezebê, wan malik 11 êzidiyan dişewitand, ew ji war û welatê wan bi. dûr . dixist in û hi zor û kotek û xofê. ew j1,01 û dtnê êzidî dtqu pandm. Ji ber vê yekê. êzîdî ji dinê xeyidî bûn û xwe spartibûn çiyayê xwe û lt wê derê bêdeng dijiyan. Daxwaza wan, jiyaneke azad û serbest û, debareke bi qîma wan bû. Wan qîma xwe bi xwarina pariyekê, bi vexwarina ava taseke, bi kêfa bîstekê, bt axa bihustekê. bi gotina dostekî dianîn. Wan û çiyayên xwe hev dtkirm, qûna, xwe bi hev dianîn. bela xwe 11 kesî nedigerandtn 11 nedixwestin ku kes ji bela, xwe li wan bigerîne.
Dinya kambax, her gav, xayintî li wan k1r1bft.
Wan ruyê xwe ber bi kû kiribu, riha wan hatibû birîn. JI lewre, wan ayet. telqîn û qewlê xwe yên niviskî, mîna Kitaba Cilwe, Meshefa Reş, Qewlê
128
,ze'bûnê Meysûr, Qewlê Sum Eflrîna Dinyayê di nav çiyayê Şengalê de. lt, newalekê, di. nav sandoqeke hesinî û kflîtkirî de vedişartin û bi kesi nişan nedtdan Sandoq li be'r destê nobedaran bû û kilît li cem mezinê êzidiyan Ixtiyarê Mergehê bû,
Em gotina xwe li ser êzidiyan dirêj nekin. Ew çiyayî .. girtî bûn ûji 'halê xwe razî bûn. Bi tenê wan

jî wekî her kesi ~ derdekî hebû; Pala Osman û KOr Reşîd, Paşayên mali şewitî. Carma Pala Osman Paşa, carina Kl),r Reşîd Paşa davête ser wan û ew di-
tirsandin.
Gava kerwana Bengîn û Meyro gthtşte Şengalê. êzldlyan qedir û qîmeteke mez:in dan, Bengîn û Meyro 'û, ew bi dil û can eztmandln. Evdalê zeynikê ew şandibûn û ew law û, keça Evdal bûn .. ~ Evdal dostê êzidiyan ê bav û kalan bû, Wan digot; dostaniya dostê xwe berde. belê dostaniya dostê bavê xwe bernede. 'Wan pir bawerî b Evdal hebû ûJ deng, huner mendî. insa : etî û di avaniya wi hez dikirin. Evdal jî ew qet ji bîr nedikirin û gava riya W'Î ber bi wan deran diket. ew diçû û I wan dibû mêvan û bi mehan, li cem wan dima. Niha karê Evdal bi wan ketibû û Ji wan tika kiribû ku ew li Bengîn, û Meyro xwedî derkevin it wan : ihewtnm etau xezeba Egîd Begê malmirat dabiketa.
Lê dewsa ku xezeba Egîd Begê dakeve. tewr ew hîn zêde bû. wî disan siwar şandin gund. Lê Bengîn û Meyro winda bûbûn. Siwar 'ber 'bi her alî de çûn. ji her kesî pirsîn, şopa her mehle qt, teyr û raw1rî hildan, ê kir! ., nekirin, nikarîbûn Bengîn û Meyro brdtttna. Erd, qehştbû '0. Bengîn û Meyro ketibûnê. Tu kesî tiştekî nizanîbû. nedîtibû 11 nebihîstibû. Xelk bûbû kor" kerr û lal. 'Vî tiŞtî Egîd Beg kir gurê har û 'kef bi dev' xistê. wi emir û, ferman bi, her deri firand1n û s warên xwe ,.lo Osmaniyan bi
129
her derî gîhandin da ku Bengîn Û Meyro bi dest xîne û bi vî awayi derba mirinê li Evdal. dengbêjê Tahar Xanê rehmetî xîne, Lê Egîd Begê' û stwa ên wî, tevî zor û zulma xwe
. bi 'tenê mabûn, kesî alikarî 11 wan nedikir
Bi vi awayî roj ~ meh û sal bihurîn. Mesele 11 ser mesele qulipîn, wext û dewran li pey hev zivirîn. Lê kin. nefret û rika Egîd Begê neguherîn. Xelkê mesela Bengîn û Meyro ji, bîr klr, lê Egîd Begê di heşê xwe de mor kir.
wext û, zeman bi vî awayî gêr dibû û diçû heta ku rojekê Kor Reşîd Paşayê malikşewitî hate ziyareta Egîd Begê malmtrat, Nîşanê baranê ba bû, nîşanê m1l1nê ta bû û nîşanê xirabî û navkoktyê Egîd Beg û

K,Or Reşîd Paşa bû. Eger Kor Reşîd Paşa hatibûya cem Egîd Begê, mana xwe ew bû ku ruh1stîn dîsan li pê û 11 govendan bû. KOr Reşid Paşa çend rojan li cem Egîd Begê ma û ew li ser rewşa dewleta Osmanî, hukmê Egîd Begê, gerandina kar û ştxulên dewletê
peytvîn, Her du all ji hev razi bûn, Şeva dawîn Egîd Begê şênahiyeke mezin 11 dar xist. Reqase û qeşmer, pehlîwan û leheng. tembûrva û stranvan ketin nav hev. B1 dehan kahr û berxên birajtî hatin xwarin û, wekî ava kahrnyê şeraba yaqûdi hate vexwartn, Derengê şevêt Kor Reşîd Paşa destê xwe avêt riha xwe, pê list, bi darfkekê, goştê navbera diranê xwe paqij kir 'û bi ptqe pîq li, Egîd Begê ku 11 kêleka wî rûniştibû, vegerî û got,
- Egîd Begê, Egîd Begê ... xwediyê navê xwe be ... Ka egîdiya te? Me bawer dikir, destê te dirêj, hukim, û qudreta te giran, gotina te qanûn e. Le em dlbinJn ku kes 11 te guhdarî nake û xelk gotina te dide bm lingan. .. Egîd Begê tu bilind ftr1yayi. nizm ketî, Te nikaribû du sêwiyên kuçe û kolananbibtnt, Xelk bi te dikene, qiIfû henekên xwe bi te dtke.; Egîd Begê. ,130
şixul Û kar bi zirt Û fortan nayên gerandin. Tu dê hûr binihêrî, kûr binihêrî û dûr btnthêrî, Ma tu bawer î ku ew sêw.iyên ixtiyarê kor li van, deran, nêzîkê: min û te ne?., Egîd Begê, dûr binihêre, ,dûr,.~.
Li ser van qtseyan, Egîd Begê têgihişt ku haya Kor Reşîd Paşa, ji tlştma hebû. Dotira rojê, gava Kor Reşîd Paşa baj ar terk kir. Egid Begê jî. bi qasî barê çend bergiran yadîgar. mucewher. kinc û libas. cil û xalîçe, çerm û xençer, 11 bergtran bar kir. hi, xwe jî. tevî siwarên xwe. li hespê xwe s:lwar bû û da pey KOr Reşîd Paşa û pe re heta bajarê Eniromê çû. wi xwe lt ber Paşa kire erd" weki gogekê
. li pey Paşa, reviya. çû 'û hat, Paşa, bi qasî têra X\Ve. Egîd Beg westand, pê keniya û pê lîst û her gotina xwe xtste heşê wî û bi dû re jê re weha got,
- Egîd Begê, Egîd Begê, .. mêr be. mêr Hinekî dest
bibe xwe. bigure, ştxul bjgertne, :Egîd Begê. JI bîr meke. destê dewletê dirêj, bi her cihî dtgîhe, guhê wi vekirî. bi her tiştî dibihîse Ew sêwiyên ku tu li pey i. li çiyayê Şengalê, nik êzidiyan in. Egîd, Begê, we

kurdan gotiye; ecelê nêrî tê, dere nane şivan dixwe. Welê dixuye ku. êzîdî, dîsan, ders û kotekan dIXWa
zin. Egîd Begê, me şermezar meke. ktrin û gotina dewletê pûç dermexe, Dest b:ibe xwe. dest, ~.
Bi gottn û beyankirina KOr Reşîd Paşa re, kêfeke boş bi serê Egîd Begê re hat. Niha rê lê, bi her awayî. vebûbû ... Ew vegeriya w-are xwe, delal derxist bajêr û da beyanktrtn ku hefteyekê kêf û şênahî ye. xwarin, û vexwarin 11 ser qonaxê ye. dawet û dîlanû govend serbest e ,KesA fahm nekir ka ev çi, tişt e Û çima rehm Û çilka rindî û xweşiyê 'ketiye, dilê Egîd Begê Bi dû sê heftan re. Gava Egld Begê çek û pûsatên xwe h1ldan .. sîh tabaren nlzami ji eskerên,
xwe û 0.. .t bi top û qumberên giran hilanî û
berê xwe da başûrê welêt, hingê sebebê şênahiya wî
131
fahm bû. Wî şopa Bengîn û Meyro hilanîbû û sefer dibir ser çiyayê Şengalê. NIha kîn 'û, nefreta wî quliptbu ser êzidiyan û weha digot,
-Nexwe, nevî Û torinên şeytên wan dêqehpan dihewînin û ji min vedişêrin. Pincên şeytên li bela xwe digerin, Jixwe ew ,gunehkarên dînê Mihemed in.
wi jî. mina xedar û neyarên êztdiyan, êzidî bi "lawên şeytên" bi nav dikirin. Wi riya, kambaxa Şengalê 1 ber xwe dant û sefer 1 xopana Şengalê hilanî. Li rê, wi du kumandarên xwet di zûtirîn wext, det şandin cem 'mezinên êzidiyan. Ixtiyarê Mergehê, şex Xelef da ku Şêx Xelef Bengîn û Meyro teslîmî kumandaran bike. Wî dizanîbû ku kes Bengîn û 'Meyro teslîmî wi nake. Lê '\VÎ, digel vê yekê. meriv dişandin da 'Im nîşan bide ku ew şer naxwaze
Sefera Egîd Begê li her alîyê deng da. Xebera kambax gihîşte gund ji. Evdal û Gule bi xeberê vectntqin Wan, mîna her kesî, bawer dikirin ku êdî mesele xelas bûye û JI bir bûye, Niha, Egîd Begê malmtrat, bi. quweteke mezin 9 davête ser Şengalê,
warê Bengîn 'û Meyro. Kîn û nef eta Egî'd Begê ewçend xurt bû ku wî ji ber kerba du sêwiyan, ev tişt

dikirin. Evdal xeberek bi beg û giregirên kurdan gîhande ku ew rê li Egîd Begê û xwînrijandinê bigirin.
Ev yeka ku Egîd Begê dikir ne 11 gora adet û 'ûstlên kurdan bû. Egîd, Begê her celeb adet û ûsll dabûn bin lingan. Beg û, giregtr, qor bi qor, kom bi kom, diçû û lt ser re. xwe bi Egîd Begê d1gihandtn, carina Jê lome dikirin, carina je tika dikirin ku ew dev ji seferê berde û vegere Beg ... giregiran digotin.
- Egîd Begê"". ev k1rtn û sefer bi mezin û gtregtrekî mina te nakeve. Ji. be'r du masûm û sêwlyan. te alay û tabûr rakirine Q te rebenê welêt daye ber xem û derdan. Egid Begê, XWÛl blxwinê nayê Ş ştln. RoJ,
132,
roja aqil û fahmê ye. Tu mezin Î, mezinahî û dilovanî ji te ye. Wan kir. tu meke û êztdtyên bêgune jî
pê re meşew1tîne ...
Mezinê êzidiyan Şêx Xelef j'î, bi kumandaran, bersîv şandfbûyê û, gotibûyê.
- Gotina Egîd Begê 11 ser seran û çavan e .. Lê, me û welatê me jî adet û ûsil hene. Ma Egîd Begê bi van adet û ûstlan nizane? Ma eger yek here û xwe bavê tor û bextê Egîd Begê. ew ê wî zilamî bide bi şûnde? Ma Egîd Begê nizane ku Beng-m û Meyro hatine û xwe avêtine ber bextê me êzld1yan,e Ew mêvanên Yezdanê dilovan û mêvanên me ne. Qedr û qîmeta Egîd Begê li cem me zahf e Blla ew her tiştî JI me bixwaze, lê bişûndedayina Bengîn û Meyro ji me nexwaze. Bila ew were, bibe mêvanê me. em keç û lawên xwe ji bo wt serjê bikine. lê em nikarin mêvanên xwe btdtne. Herçi şer et em jê dtrevtne û em bi Egîd Begê û dewleta Osmanê Ali n1kanine û em li ber wan ranabme, lê em li ber alemê şermezar nabine, û bi adet û ûsilan nalizine ....
Xeber û silavên ku Şêx Xelef şandin. hatin û 11- bergerîna beg û giregiran pere nekir. Fersend bi deste Egîd Begê ketibû û \VÎ pişta xwe 'bi gotinên KOr Reşîd Paşa şidandibû. wî li kest g ihdart nekir û avête ser Şengalê. Ciya ase bû. bihur tune bû", tê re çûyin çetin bû. Egîd Begê top û qumberên xwe 11 cîh hîştin û, bi siwaran kete Şengalê., Ezldlyan Il ber xwe nedan, wan xwe bi şûnde vekişandin. ber bi na ... venda çiye. Newala

Laleşê' çû . Wan Beng-m 'û Meyro mîna çavê xwe dipamstln û cihên wan her tim diguherandin Newala Laleşê kahniya ola êzidiyan bû û cihê wan ê rmqedesttrîn bû. Mala Ixtiyarê Merg:ehê'. mezinê fzidiyan li wir bû. Hemû avahiyên miqedes ên eztdiyan û kitab û defterên wan ên veşartî wir b" n Li wê derê. bi navê Berê-reşê Mleleqy Kaf.
133
Z1mzim Û Kaniya Spî çar ziyaretgehên êzidiyan hebûn û heta êzidiyekî ew cîh ziyaret nekirina 01- perwerî û heca wî qebûl nedibû. Newala Laleşê ewçend miqedes bû ku êzidiyan di Qewlê Sura Efirîna Dinyayê de weha gotibûn,
Xudavendê me hoste ber e, Laliş jo'rde anî xware. Laliş bû xweş' cîh û war e. U erdê şÛl bû, nebat e,
Pê zeyinî zêndî qinyat e .
Newala, Laleşê dilê êzidiyan bû.
Lê be e. ma ev yek bi xema Egîd Begê bû? wi û siwarên wî xwe bi Newala Laleşê gtrttn û bt dirêjahiya mehekê cu çiya, û zinaran de bihurîn û xwe bi doraliyê Laleşê gîhandin Hingê wî. ji nû ve. xeberek hi Şêx Xelef gîhand da ku êzîdî Bengîn û Meyro teslîmî wî b1ldn. Lê herweki gotina Egîd Begê. gotina êzidiyan Ji gotin hû. Hingê Egîd Begê û siwarên wt b ser êzidiyan de girtin Lê ne rasterast li cîhên miqedes, 11 doraliyên cîhên miqedes. Şerekî mezin li wir qewimî. Ezidiyan bi mêranî li ber xwe dan û BengiIl û Meyro parastin. Lê biserketina êzidiyan bêîmkan bû. Siwarên Egîd Begê êriş birin doraliyên Newala Laleşê it gund xirab kirin.
Jin, mêr, kal - zarok kuştin, agir bi dar û ber xistin, pez û dewarên wan serjê kirin.
Ezidiyan fahm kir ku halê wan d!jwar bû. Ew li hev civiyan û biryar dan ku hemû quweten xwe vek1şîn1n navenda Newala Laleşê û newalê hem ji bo xwe hem ji ji bo Egid Bege malmîrat û eskerên wî bikine goristan. Kesi diviya destê xwe neda kitab, defter û cîhên wan ên mtqedesl.. Mirin ji wê kirêtiyê çêtir bû. U hebûn.jtyan û parastina Bengîn
134

û Meyro ji canê wan girîngtir bû, Loma wan Bengîn 'û, Meyro. tevî çend stwaran ji. meydana, şer û Newa a laleşê bi dûr xistin û şandin aliyê din ê çiyayê Şengalê.
Lê hin sextekar û fêlbaz li çiyayê Şengalê ji hebûn.i. Xebera çûyina Bengîn û Meyro, bi leza birûskê. bi, Egîd Begê gthtşt, Egîd Begê keniya û simbêl bada û taximekî siwar bi ser riya Bengîn û Meyro de şand. Siwarên Egîd Begê hema êrtş nebirin ser sêwiyan. Dewsa êrişê. wan rê da ku kerwana biçûk a rêw1 dayiyan ji Newalê 'bi. dûr keve. U şevekê, wan avêt ser kerwan 'û di şikeftekê de ew girtin. Siwarên xwînrêj êzldtyên canfeda ku bi Bengîn û Meyro re 'bûn" kuştin û Bengîn û Meyro bi saxî girtin û bi xwe re birin cem Egîd Begê malmîrat.
Egîd Begê bi ser settbû. Wî sêwiyên stûxwar girtin û ji ber çavan winda kirin. Dîsan weki ku erd qelişîbû û ew ke tib 6 nê. Bengîn û Meyro bêreh û bêşop winda bûbûn Kesî nizanîbû ka ew mirine yan mane. Ricacî û elçiyên ku, diçûn, cem Egîd Begê û jê halê Bengîn û Meyro dipirsîn, destvala vedigerîn.
Egîd Begê bi simbêlê xwe dilîst û bi ken û qerf JI wan, dtptrst,
- We negot. 'ma halê Evdalê kor niha, çawan e?
Bi qasi deh rojan, beri wê roja Ne\VIUza ku Evdal xwe li çiyayê Sîpanê Xelatê girt. Evdal xebera girtina Bengîn û Meyro bihîst. Dinya wi ya 'reş, bi carekê, bû doj'eh, agire cehenemê bi beden il ruhê wi ket. Gulê kir qîrîn û nalîn. Mala Evdal û medresa wî bûn cihên şîn û tahztyê. BI sedan, bi hezaran kes hatin - hale wa pirsin û bêdeng hêstir barandin, axîn k.tşandin ..
Ji deste Evdalê kokim tiştek nedihat
Kirin 'Q tevgera Egîd Begê malmîrat 11 bajar.
135
gund, cîh û deverên welet be av bû, Xelk li ber bûyeran diket
lanet li Egîd Begê dibarand. Lê ji destê kesekî tu 'tiştek nedihat. Li welêt kes nîn bû ku bikariblya 11 hember kîn û nefreta Egîd Begê rabûya û dengê girîn, qîrîn û nalîna xelkê bilind bikira.

Xwendevan û guhdarên xwedî sebir Û bîhnûreh, aha. gava ku Evdal biryara xwe da û xwe li çiyayê Sîpanê Xelatê girt. hal. hewal û rewş weha bû û loma xelkê j,i bi dû wi dabû.
Em e, niha, dîsan, xwe bi Sîpanê Xelatê bfg:1hin1n û werin cem Evdal. Gulê û xelkê,
136
G
.138
Xebera Xwe,
ROJ eke xweş û bendewa qulipîbû. Berb,angekê çûbû, yeka nû hatibû. Di dirêj ah: ya wê roje de. ew
xeberên ku Evdal. Gulê û xelk li, bendê bûn. hê ji ne-hatibûn. Dinya sayî bû û dest bi ronîbûnê ktrfbû,
Gennahtyeke tenik û sivik, ji dûr, dihat û X\Ve bi serê "çiyayê, Sîpanê Xelatê digihand. Dinya bêdeng bû. JI dengê Evdal pê ve. tu deng nîn bû, Xew hê bi çavê Evdal. Gulê û yên mayî neketibû. Ew j1 serê çiyê daneketlbû ' û neçûbûn; neketibûn 'nav konên xwe yên reş û nebûbûn hevalên xewa xweş. Ew li, benda xeberan bûn, Ew westiyayî bûn, û 11 dora agirê li kêleka, gola spî, rûniştibûn '0 li Evdal guhdarî dikirin. Gulokên agirê êzingan hê xwe dtlivand û ber bi jor dibûn. Lt wir, ji xweliya êgir, girekî biçûk hatibû pê û agir Ji gir adibû. Agir li ser ava spî ya golê şewq dida ,'~ dlbir1qi.
Berbangeke n -
rojeke nû dest pê dikir. Jiyaneke nû dest pê dikir. Stêrk vedim1rin û diçûn ava. Tirêjên royê. bi giranî, serî hildidan. Kulnk,ên nû dfbtşkuvîn. Çûk 6, çivikên nû hêkên xwe d1şkandin
û bi wîçewiç dest 'bi jina ve dinê dikirin. Dilopên
139
say1ya sibê 11 ser giya. kulîlk, pel û daran dibiriqîn. Golê rengê xwe diguherî. ji rengekî girtî yê şevê diqulipi ser rengekî vekirî yê gewrê taştlyan. Li jêr. nêzîkî ko n,an, hespekî hîrehîr dikir û diza û cahniyek diant dinê. Teyrekî, ji jor, dixwend û xêrhatm 11 roja nû dikir. Dinya hişyar dibû
..

Evdalê Zeynikê. jtna 'wi Gule, lawê \VÎ Temo, şagirtên Evdal, heval û dostên, Evdal û xelkê Evdal. 11 serê çiyayê Sîpanê Xelatê, H kêleka gola spî. rûniştibûn û şahidî li çerxa dinyayê û leza dewr û dewranê dikirin û dlpan; jina Temo Zînê li ber welidandinê bû. rêber û gundî şop biribûn ser Bengîn û Meyro û 11. rê bun ku xwe b wan btgthrntn. ,Ji bêxewî. west. kerb, derd û keseran, çavên Evdal, mîna çiyayê agir 'bi dev ke' ." dêşlyan û dlşewltîn. Bîhn û hilma bihara teze û heyama nûbişkuvi û hatina teyr û qulingan. qultngê baskşfkestt dîn kiribû û ew nedihewiya ..
Wan dtpan 'û guh didan stranê Evdal.
LI Jêrê. di nav konan de jî~ jiyanê dest pê kiribû.
Xelk hişyar cUhû û ji konên xwe yên reş derdfketm û bi ava sar a kahn1yê dest û rûyê xwe dişuşUn. Konên doraliyê Sîpanê Xelatê reş dikJr1n. Kon ji mûyên bizinan hatibûn risandin û hûnandin Kurdan j konên reş pir hez dikirin û digotin, "konê reş, warê
xweş. U U weha, bi vi awayî. li çarmedora Sîpanê Xelatê Il konên reş vegirtin û doralî bi reşahiya konan pêçandin, celebeke dengdan bû. Dengdaneke bêdeng. Xelkê, singê konan kutabûn û serê konan hildabûn û bi. bêdengî deng dabûn.
Denge dengdana bêdeng Evdal bû. wi bêwest û bêrawest, her ûher, dengê xwe bilind dikir 11 digot. wi berbanga nû. roja teze nedidît, lê bi de gê' xwe, xêrhat1nî lê dikir.
.
.. ,
1
4
0
Hey li mtnfelekê.
Te çima lt min weha kir?
Te teyrê xwe berda. koma refê min belav kir.
Te ez kirim qutiki pale. dev û lêva wî şima kir. Herçî dost bû, te li min mel'ûl kir,
Herçî dfjmin bû. te li min şa kir.
Hey 1,(m,tnjelekê.

ZA>Za.nê Si'panê Xelatê xweş e, li siya darê,
Felekê ez şaş kirime, berdaye, geh lijorê. geh li xwarê,
Felek xayin e, dewran bêbext e, dikime-naktme, qet nayê li karê.
Hey lt m,in,jelekê ....
Evdal bi deng, pejn û hisan dij ya, ne bi çavan.
Di nav çend salên dawin de. hem ew. hem Gulê pir ketibûn û bi qasî kulmekê mabûn. BI xêra deng. gotin, kilam û stranan. ew hê ji d1kan"bûn li ser piyan bûna. Evdal, niha. kalbûn û pîrbûna kambax, bi cavan, nedidît, lê dUê wî, ruh û canê wi. weki çola bin tava germ, qewlrîbû . Li milekî din, hêz û pej a bi bîranîn û 11 pey dewr û dewranên bihurî ketin, 11 nik Evd,alt pir bi pêş ve ketibû. Wext. dem, dewr û heyamên bihuri, niha, mîna dilopên zelal, yek bi yek, dihatin bîra Evdal. wi do û iro. heyamên kevnare û heyamên nû, bûyerên qewimî û
hedîsên diqewimin. serpêhatiyên bav û kalan û siûda xwe, Gulê, Temo. Bengîn, 'Meyro. Tahar Xan, Şêx Silê. quling, bi hostehî, dixiste nav hev û jê kilam û stranên giranbiha dianîn pê. Pir caran. wi stranên kevn, serpêhatiyên qedîm digotin. lê belê. dt esasê xwe de. qesta wî roja wî û hedîsên heyama wî bûn. Loma wî rewş, tevger û hedîsên roja xwe r 11 stran û serpêhatiyan zêde dlldr û ew, li gora. xwe, di ..
xemiland, dtkemlland û ji n - ve. dirêsand. Evdal merivê kêfû henekan bû, Lê mixabin, ku ew li wela-
141
tekî dijiya ku derd û keserê pir kûr, jê bi dûr nedibûn. Ji. ber vê yekê, piraniya stranên wî zîz,
melûl. xemgtr, keserkûr û b1şewat bûn. Ji roja ku ew kor bû û vir ve, kes-neblhtstrbû ku wî straneke bi kêf û henek gotibû. Heft sal wî dengbêjiya xem, keser û derdan kiribû. Stran û eserên wî neynika
jiyana wi. dengê ruh 'û dilê wi bûn.
Di wê berbanga nû de, wî dil û hêvî hebû. ku stranên bi kêf û henek bigottna,
Tevgera xelkê, çûyîn û hatinê dest pê k1rlbû~

Deng zêde bû bûn û şêniyên ku 11 dora Evdal r'ûntşibûn, disan, zêde dibûn. Zarokan dest bi qîrînê kiribû. Gava tîrêjên royê xwe bi bilindahiyên S
panê Xelatê gîhandfbûn û bi şewqa xwe zora reşah ya şevê btrtbûn, hingê xortek.i û sê pîrejin. j' aliyê konan, derketin A bi qîreqîr 'û xirecir, ber bi serê çiyê, koma şênî hatin. çaxa wan nêzîkî 1 civata mezin kir, hemûyan, bi dengekt û bi. qîrîn. bang li c vatê kirin û gotin.
- Mizgîniya me li we, mfzgîniya me li we... Zaro.kekî Temo û Z ... nê bû, zarokek hate dinê ... Z-nê
mala Evdal û Gulê şên kir, lawekî mîna topa nûrê ani dinê ....
BI vî awayî. wan xebera xweş bi cimatê gihand ..
Hingê bedena Evdal ajar beziya. ew ricifi û nefes lê çfklya. wi xebereke weha xweş nedtpa. Ev heft sal bûn ku şeve
reşekê bi ser wî de hatibû. nan û av lê hertmîbû, derd û keserê nefes lê çtkandibu, xewa
şevan lê heram bûbû 'Û' ew bi xebereke xweş hesret mabû. B qasî kêlîkê. ew bêdeng. bênefes ma. Hay lê dinyayê ... pîrozbayi û bextlyar1yê nefes i Evda çikand b'û û deng jê dernediket ... Bi dû biskekê re, Gulê' deng 11 Temo kir 'Û got.
- Temo. lawo ... rebeno. şîrhe1alo .
tu bûyî bav. ez bûme Pîrik. Evdal bûye kalik, Xweş e. roja nû xweş
142
e, xweş dest pê kiriye. De rabe. lez ke" bilezîne, bireve û xwe bi kon bigihine. lawê xwe bibîne. ji. çav
..... ni Zînê k
'U, e ,ya ' me maçe.
Temo xebera xweş têgfhîştfbû. Wi, bi ken 11 doralî nihêrt. Herçî Evdal bû, bêdeng bû, lê Ji kêfa wî re payan nin bû. Temo rabû ser xwe. Gulê û pîrejinan dan tllî11yan û Temo dest bi revê kiri Lê ne ber bi konan. wî dest pê kir. li dora golê reviya û zivirî. wi tiştine digotin. lê kesî fahm nedikir. Ew kêfxweş 'ba. Ew bi. têra xwe, çend caran. 11 dora golê zivirî. Paşê ew hat û di ser sere bav û diya xwe re sekinî, 11 wan û li şênî" bi. dirêj ahiya çend hllmên qelûnê, nihêrî û ji nişkekê ve, berê xwe da konan, reviya û

çû. 1lrêjên royê, ji aliyê ku Temo ber b:1yê direviya, hildihatin. Temo zerahiya asoyê û sorahiya tîrêj an da ber xwe û ber bi wan reviya û ber bi aliye konan, ji ber çavan winda bû
Xeber xweş bû, lê dinyajî bi dor bû, geh li Jor, geh I1jêr b ~ .. ~ Nfhajî, em ê bên ser xebera nexweş.
143
144
2 Xebera Reş
Qeda 11 dmê bikeve. Ew b:irînan acebirine, nexweşan sax nake. nexweşiyan ji meydanê ranake, kêfxweşî û dilxweşiyê daîm, nake. Xebera ku ptrejtnan bi Evdal û doralî g~ and. kêfxweşiyeke boş 11 ser Civatê û xelkê reşand. BI d
xem. keser û bîhntengya mehan re. ev xebe bû mîna, barana biharê ku xêr û bêrjî pê re dihat. Gu ê
ûjtnan dan ttltltyan, xort rabûn govendan. dengbêj û stranvanan dest dan ber guhan û awaza stranê gihandin, bi esmanan" xelkê da çepikan û Evdal jî.
ji kêfxweşiyê. kete nav xewn û xeyalan Gelo hebû ku siûda wan qulipîbû? Hebû ku feleka kambax rû ji wan badabû? Hebû ku ew tiştên ku 11 gund ê beyan bûbû :. niha dest pê kmbûn.v. û Sîpanê
Xelatê hatibû hawara wan?' ..
Gelo hebû ku çavên wî ',- vebûna û bask û perwazên quling sax bûna fl quling xwe refên heval
û dostan bigihanda?
Bi dû, demeke bedengiyê. Evdal disan destê xwe
bir ber guhê xwe .. Niha kefû heyecana wi bilmdttr, bawerî û hêviya wî: têkûzttr, deng ,A aWa7..8. wi xurttir
145
bû.
Konên me derketine Sîpanê Xelatê, van deran. Evdalê Zeynikê kor e, ew maye li ser firaran; De wayê, li min wayê,
Qeda bê li serê te dinyayê,
Erê qulingo. erê, li Sîpanê Xelatê diqûini, Dil û cîgera min tev dihelÛlÎ.,

Xwez'iya wan salan. wan zemanan.
Perwazên te sax bûn. ezjî bi selametî li ZOZ'anatl, Qultngo de bibêje, btqirine.
Derdên te zahf Îll, baskên te şikestî ne.
De were. em XLVe bidin ber hîkmet û qudreta Sîpanê Xelatê, BUa çavên min S~ ke. baskên te bicebtrine.
Quling jî dest bi qîreqîr kiribû, dengê wî jî li dengan zêde bûbû ... Kela Evdal rabûbû. Di berbanga wê sibê de. wî got fl got. Stran . pey stran. serpêhatî ,U ser serpêhatî. hedîse 11 ser hedtse, Kurdistan bû straneke bêhudûd û kete devê Evdal. Dinya bi peyvên Evdal hate hûnandin. Si.ûd bûn rêzên stranên Evdal. Egîd Beg - namerdiyên wi. 1 ber lehiya stranên Evdal, bi xîçe .. - biçûk. Evdal digot
- Lo, lo, şagtrtmo, lo, lo .. dilê xweş her lê bihar e Xwediyê dllê xweş nemir e û her lê qaleqal e. Li şairê me yê mezin Ehmedê Xani binihêrlne û lê hûr bibine. Bi dû Seydayê Ehmede xanî re. gelek mîr, beg û giregir hatine û çûne. Ka j. wa kîjan nav mane? Lê navê Seydayê mezin abadîn e,. li ser birc û, kelehên welatê me nivisî ye. Kirina Egîd Begê. kirina kesên bênav. bêtov û bêrê ye. Egîd Begê iro heye. sibê 'tune.
01 lehiya stran û gotinan de, bêguman. sing û sitûna esasi Bengîn .. Meyro bû. Heşê Evdal her 11
146
ser wan bû. Gelo çi bi. wan qewimîbû? Bi dû xebera piroz a lawê Temo re. roja nû dê xebera xêrê ji, aliyê çiyayê Şengalê bi wî negîhanda? Dengê Bengîn, û Meyro dê. dîsan, bi guhê wî: neketa? wi dê. disan, ew 11 ber coga xwe 'neda rûniştin û]t wan, re stran negotina? Evdal qise û gottn li hev dianî. li hev dtgerand û bi siûda Bengîn û Meyro digihand.
- Ge ,A hevalan.i. dosttno., It hogirên payiza umrê mtno.v, ez neketime ber gtrtmê, Girtin, girtina mêran e. Qeyd xlrxalê şêran e. Derdê min rabûn û hilweşîna adet û ûsl1an e. Ma we dîtiye,. bihistiye ku mezm 'û, beg 11 pey sêwiyan, e. b:i. dû dilgir û evîndaran e? Welatê 'me mîna berfê spî ye. paqij û delal e. warê adet û ûs1lan el Lê îro ker û kûçik 11 serê dizmne û dtewitme. Li min bfbthurme ku ez niha vê qisê dikime, lê belê, j1 berfê spttir tişt tune Û ker û kûçik hatine û li serê dtrîne.v, Lê min ,Ji Yezdanê

pak û dilovan, hêvî heye ku ew Bengîn û Tavbanûya min bi min b1g:1hine~
Evdal hê weha dipeyivî, hin pîrejln, ji aliyê konan, hatin û bêdeng dest 11 Gulê kirin. Wan bi dest nişan dan ku, Gulê, bi, hêdîka, bêdeng rabe û ber bi wan here. Gulê rabû û ber bi wan çû. Bi qasî bîstekê. wan. ji, Evdal û, civatê bi dûr, pistepist kirin û paşê. bi hev re, ber bi aliyê, 'konan vegerin û, çan, Evdal. pê hesiya ku Gulê çû 11 wî bi ken got.
- We dit ... mehrûma Gulê nehewiya, Ew çû neviyê xwe bibine.
Piraniya kesên ku dabûn pey Evdal û, hatibûn serê Sîpanê Xelatê. gundî bûn. Gelek dengbêj" stranvan. govengêr, ,çiro'kbej" mttrtb, sazbend. bilûrvan û hunermend Ji piştgirtiya, xwe nişan dabûn û hat bûn ba pirê xwe. Beg û giregirên ku qedr û qîmet didan, Evdal û j rewşê û ldrlnên Egîd 'Begê û
kesên wekî Eg-d Begê nerazi bûn, silavên xwe dişandin û bi xwarin, vexwarin. kinc û cil radibûn.
147
Wê gavê. l welêt. ecêpttrtn tişt tora ku, dengbêjan 11 seranserê welêt rtsandtbûn. bû. Wan hevûdu dinasîn û haya wan ji hev hebû. Wan, gotin. fikir û xeberên xwe diguhezandm hev' Xebereke. gotinekê. daxwazekê dikarîbû, di nav rojekê de. ji mtlekt welêt bigihîşta milê din U di navbera çiyayê Şengalê iî çiyayê S
panê Xelatê de, wan xeber dtbrrin û dianîn. Loma xeber ZÛ diçûn û, dihatin.
- Alimekî bi allemê ye, Evdal got û peyva xwe domand. birîndar bi birina xwe dizane. hekîm Çi Jê dizane? Li welatê me alîm kêm e. ew bi tiliyên, destan tên h ~mart ne. Li a ilû Osmanî. 11 alîkî Egîd Begê û kesên mina Egîd Begê welatê' 'mîna berfê spî û paqij kirine seyrangeha cahîl û nezanane, ne meclîs û dîwana xwendan e,. ne aqilmend û aliman e... Dijminên kitab. defter t adet û ûstlan li ser hukima ne. De wertn, ji min, evdalê Xwedê re btbêjtne, ev hal çi ha e?. Min bfhisttye, Egîd Begê gelek xirabî bi êzidiyan Jî kiriye ...
Di, wê navberê de. Gulê. bi komeke jin û mêr û xort, vegeriya cem, Evdal û, civatê. Rûyê wê sar. çavên wê bi g1ri bûn. Ji komê deng dernediket.

Ew, bi, hêdîka, hatin û peregende r'ûntştttn. Gulê jî li kêleka Evdal rûnişt, Civatê dît ku tiştekî ne bixêr hatibû 'pê. Lê, Evda
, Gulê û kom, 'ned dit. Ew pêhesiya ku Gulê evî hinekan hate. wî gotina xwe 'birî û li Gulê vegeriya.
- Gulê. mehrûmê ... Te lezand û xwe bi torinê xwe gîhan,d~ De ka bibe, torinê t,e çawan et bi kê dişibe? ,Zînê di çi halî de ye,?
- Evdalo. mehnlmo ... torinê te pariyekî şekir e, çflkekî zêr e.. Ew dtqîre.,; 11 girina wî mina stranê ye. Ew li kalikê xwe. dengbêjê welet Evd,alê Zeynikê çûye. Çavên wî mezin, eniya wi vek1ri ye. Nûr li, ser
rû dibar1ne. Herçî Zînê ye, Ji kêfan diftre, lawê xwe
148
kiriye hembêza xwe û dilorîne Dê û law t her du di nav cihekî de, mîna me aytkan, radikevtne ... Lê ez çi bikim. qeda li dinyayê keve. kêfxweşiya me di gewriya me de dtqurmiçe. Hal ne hal e.
Gulê li wir sekinî, ew hew dikarîbû blpeyiviya fl
bigota.
- Gu êt mehrûmê ... t jina min a çend salan î.
.... hê in - V artt ,- d~"""" ...
Ş m, can u ru m ,,1. eş' 1. U , uziyen me
nin In. Tu qise û gotinê dtgerinî. qesta ttştma dikî. Tu bi xwe pê dizanî: eger av di golê de btmtne. dibe genî. Tu bi qise 11 gotinên xwe yên vekirt bi nav û deng î. De were mehrûma min ... eger çi be ji, tu dê gotina xwe Ji m " re bibêjî,.
- Ma ez çi b bêjim. Evdalo, mehrûmo ... TIştê ku bi serê me de tê, bila bi serê kesî de neyê. Berî niha bi bîstekê, rûyê me b ken, dilê me bi kel nû, me şukir û hemd bû. Niha rûyê me bi girin, devê me bi qîrîn, dilê me bi birin e. Xwedê li me xirab aniye.
Ma ez Çi bibêjim, çawan bibêjim. Ji kû dest pê bikim? Hawirdor geremol et lt aliyekî nûr e. li aliyeki tarî ye. De ez çi bibêjim Evdalol dfl bi kula.
ji hundir b:irîndarol ..
Gulê destên Evdal xistin nav destên xwe 0. ew guvaştin. Evdal. niha, disan, dest bi hezinê kir. Digel ku dinê hê sayî bû, dilopên xwîdanê i ser eniya w1 civiyan.

- Mala minê, wî got, niha mala min şewitî, per-
gala min belav bû. Niha Egîd Begê pişta min şikand. ruh û canê min guvlşand. Wey 1 min ... Tavbanûyê. çavbelekê, kezîzerê ... Bengtno, çelengo, delalo, lawo. . axxx.; Gulê, mehrûmê Gu e. de' bibê ka çawan bûye. we çi bihîstiye. Gulê ...
- Evdalo. silldxirabo. te dil çi bi serê me de hate?
Mala me şewittye. ocaxê me belav bûye. Egîd Begê malmîrat Bengîn û Meyro b kuştin dane ... ha ho ...
149
1
Rîkaj
ma ev qise dê jî j.1 devê min derketa, haho. . Niha, berî bîskekê. du siwarên êz' diyan xwe bi me' gîhandine û xebera reş gotine. Ezîdî, gundi û dengbêj li ser şopa Bengîn û Meyro bûne. Wan Bengîn û Meyro, 11 kê eka çiyayê Şengalê, 11 bthu .. rekê, di nav şikeftekê de dîtine. Bengîn û Meyro li kêleka hev razayî bûne. Destên wan li ser hev. rûyên, wan 'bi ken û bt hUZÛr bûne .. 01 şikefta tarî det rûyên wan ronî û aram bûne, Li ser laş û bedenên wan şopên lêdan û birînê nebûne. Ew di nav kincên xwe yên spî û paqi] de, mîna du perî û melayikan. raketî bûne. Porê Meyro guli û keztktrt, simbêlê Bengîn badayî bûye. Li gora gotina stwaran, Bengîn û Meyro bijahrê mirine. zalim û malmtratan jahr bi wan dane. De b bthtse, Evdalo. bibihîse. ka zaliman çi bi law û keça me ktrJne û sêwiyên me ji me girtine. . Mezlnê êzidiyan, doste te, Şêx Xelef bi xwe çûye û meyttên Bengîn û Meyro girtine û birtne
Newala Laleşê û 1 wir ew veşartine. Niha çiyayê
Şengalê reşa xwe girêdaye û 11 şîna xwe rûniştiye .
De ez Çi bibêjime, .xwe bi kû de bavêjime .
Mehrûmo, Evdalo. de destê xwe bavê ber guhê xwe, bistrê û bibêje; royê bigtrtne, ewran li ev biqultptne, baranê bibarîne, agirê, li, serê ma mîratan bibarîne. çiyan li hev bine û deng û awaz û şîna xwe bi hemû allemê bigthtne. ..
Evdal bêdeng li Gulê guhdarî dikir. Hezîn û lerlzînek bi canê Evdal ketibû. Ew diricifi. Destên wî, di nav destên G lê de. wekî hêlekanekê, diçûn û

dihatin Hundirê w- dişewitî. Germahiyekê bi ser bedena wi re hatibû. 'WI care ê-du caran, xwe livand. hewl da xwe tl xwest rabe ser piyan. Le, digel ku Gulê ji alîkarî lê kir. ew nikarîbû rabûya. Ew, bêgav, 11 şûna xwe rûnişt, wi devê xwe vekir û xwest
tiştlna bibêj e. lê peyv û gotin jî, ji devê wî demeke-
150
tin. Gulê têgthîşt ku halê Evdal, ne tu hal bû Wê, bi qîrîn, bang 11 dorali kir.
- Evdal0, Evdalo .. ~.. zû kin, bU ezîn1n , çend kulav
û lehîfan bînin û bavêjin ser Evdal. Evdal JI dest dere. zû bûezînm. .. lo. lo, Evdalo, sebra ber dilê mino ...
Gule bi 'Evdal girt û serê wî danî ser' çoga xwe.
Şê'ni li serê civiya. Hinan çend kulav anin û avêtin ser Evdal û ew baş pêçan. Hê Jî, Evdal dixwest ttştma bigota. Lê Gu' ê devê wi girt, "mepeytve, mehrûmo, mepeytve" got, eniya Evdal paqij kir û enî Û ruyê Evdal. hêdî hêdî, mist da û di dewsa Ev,dal de. 'wê dest bi gotinê ldr ~ bi dengekî pir nel,n1 Û zîz. 11 ser Evdal. lorand,
Xwendevan û guhdarên ezîz. herwekî hûn dibînin, berbanga wê sibê, berbangeke têkel û têvel bû. Meriv dikarîbû bi zehmetî melayikan ji tb' îsa '. malavayan Ji malmtratan, nûhattyan ji wi dabûy1yan, kêfxweşî û bextiya yê JI xem û ke-
seran veqetandina. Halê rebenê. :Evdal ne besî wî bÛ9 d1 ser de. xebera reş bû serbare wî, ..
Bêguman. em ê Evdalê zeyn . ê di wi halî de ne-
terlkînin 'fl wi bi te ê nehêlin. NIha em ê pê re herin fl b1n1hêr1n ka roya ku, di 'wê berbangê de, hêdt hêdi" hlldlhat. ê çi nîşani me de.
151
152
3
Ronahiya Roje û Xweşiya Esmanan
Evd.aljl xwe çûb <IL
heş li seri nemabû. Ma bedena Evdal a kal û Jar ê çawan bikaribûya xwe li hember ewçend bûyer û hedîsên giran rabigirta? Di dewsa \\TÎ de kevir

bûya, kevirê bi kev1r1ya xwe biheliya. Çavên, wî veki.rî, li erdê dirêj'klrî 'û serê wî li ser çoga Gulê, Evdal hêdi hêdî nefes digirt û dida, Taqet 'û quwet di can û bedena wî, de nemabû. Çavên wî ketibûn kortê, rûyê wî yê qermtçt bi qasî kulmeke mabû. Ji ber deng. gotin û stranan. lêvên \VÎ teriktbnn û qelişîbûn Simbêl û riha, \VÎ dirêj bûbû û weki: pembû spî bû. E'ni. rû û bmçavên wi bi qermîçokan tijî 'bû. Reh û damarên wî di bin çermê tenik de xuyabû ' ..... Wexta kambax, bi, her awayî, şopên xwe li ser rû û bedena wi berdabûn,

Destê Gulê, hêdî hêdi" 11 ser enî û, rûyê Evdal digeriya û Gulê, bi hêdîka, jê re dinehwirand. ,şagirt. heval û dostên Evdal û xelk, hinekî Jê bi dûr t rûniştibûn û bi dilekî zÎZ û nîyeki bi endişe, 1 Evdal dinihêrin û n1f1r 11 Egîd Begê xwînrêj diba-

randin. Jin it pîrejin Ji. hêdî hêdi, hêstlr d1rljandin

,153

Bêyî Gulê. çend kesên din Jî i ser Evdal bûn.

Gundiyekî lezandibû û ji onan, şîr û mast anîbû. Gulê. pêşî. xwest tasa şîr bixe devê Evdal. Lê wî devê xwe pê nexist. Paşê Gulê tasa mast ber bi devê wi' kir t wî devê xwe vekir 'û çend dilop mast daqultandin. Gulê hêdi hêdî mast dayê heta \VÎ hemû tas

vexwar. Ro bi qasî bihustekê-du bihustan hilatibû. Hawirdor bi tîrêjê royê dfbmqt, Taya royê li ser ruyê Evdal dixist ,~ simbêl û riha wi dibtnqand, Di bin taya royê de. rûyê 'wi bûbû, rûyekî nûranî. Niha hezîn Û, lerizîna WI. hinekî, daketibû. wî bi awayeki saktn. rehet û bêdeng li Gulê û li dengên din guhdarî dUdr. Welê dixuya ku ew hinekî bi, ser xwe de dihat. Bi dû bîskekê r,e. wi destên xwe ji bin kulavan derxistin û destê Gulê girt û ew danî 'ser singa xwe. Dev û lêvên 'WÎ, bi hêdîka, liviyan û wi pir bi giranî

weha got,

- Gulê. . mehrûmê .. te dît., heş 'û bedena min ji

xayintî li min kir Dinya ye, Gulê. dinya ye. Heta min can û laşê xwe nas kir. umrê xwe xelas kir ...

Gulê û kesên din ên ku, li serê bûn, nedixwestin ew bipeyiviya. Peyv bi zehmetî Ji devê wi derdikettn, Rûyê wî reng guherîbû. gewrî û qirika wî

vektşîbû. Gulê destê xwe, bi hêdîka. 'da ser devê 'wî û, jê re got,
- Evdalo. dewlemendiya dtlê mino ... de xwe rabigire. dengê xwe bibire. hinekî îstlrlhet bike, bihna xwe bide û rakeve. Got1nê'n te. jixwe, her 1 ber guhê me ne. Oava tu hişyar bûyt, dtsan, gottnên xwe bibêje.
Evdal destê Gulê guvtşand, sere xwe hinekî btlmd kir'. zimanê xwe 1, ser lêvên xwe gerand tl qiseyên wê birîn.
- G lê. mehrûma minê, .. ~ hêz û quweta min dengê
min e. isreheta min kllam û stranên min e. Bi xêra
154
stranan can germ e, ruh nelln e. dil berdewam e. Gava deng ji min dernekeve, strana min xwe bi dil û canan negihîne, hingê ruh ê ji can derbe, min bitertkîne.. Gula minê .. hêvî di ser her tiştî: re ye. Hêvî her gav. li her warî. digel her tiştî, hebûna min e. Kirêtî pir et nizm aht , btçûkahî, xirabî bêpayan e.
Şûr û dermanê wan baweli û hêvî ye ...
,Li, wê derê, Evdal gotina xwe birî. bîhna wi, dîsan. çik1ya. wî hine- din mast xwest. Gulê taseke din mast dayê û bi dû mast re, enî
rûyê wî, bi ava sar şuşt. Hingê Evdal çavên xwe girtin û di xew re çû. Gu ê hevalên Evdal. bêdeng, 11 hev nihêrîn. Wan bawer dikir ku Evdalê ku xewa şevan jê re bûbû heram, ê niha biketa nav xewa şêrîn. Lê
piştî bîskekê. Evda dîsan xwe livand û bi destê xwe. 11 destê Gulê geriya wi çavên xwe venekirin. Jixwe, çavên wî vekirî yan girtî bûna, tiştekî nediguherî. Dinya wî, bi tenê, yek bû; tariya şevê. Ev rasti dê çawan biguhenya? Gule jê re got,
- Evdalo ... de dengê xwe meke û rakeve. her tiştî
ji bir bike û rakeve. wext 11 ber me pir e, zeman li me fireh e. Gava tu hişyar bûyî. em dtpeyfvtne. a'.
Ev'dal gotina Gulê, dîsan, birî.
- Gulê, mehrûmê ... w-ext ne wexta razan û xewan
1. Mlrly~n me hene, şîna me . benda me ye. Wext,. wexta girêdana reşa şînê ye. Em divê 11 şîna xwe rûnine û Bengîn û Tavbanûyê di mezelên wan de sêwî û stuxwar nehê1 ne. Kesê ku li ştna xwe rûnene, qedr ... qîmeta mtrtyên xwe negire. ne

mirov e û ne kurd el Tavbanû û Bengtnê stûdxtrab çûne diyarê rehmetê. sere xwe danîne ser axa gorane ... Gulê. Ou ê. wey li minê, Gulê ... Ew ji kîsê 'me û kurdan çûne. Gulê, bextreşê ... Min niha tikane
ji te hene. Şîna Bengîn - Tavbanûya me divê şîneke bêpayan be ku kesi hê neditiye ... U dilê min dibê, b
dû şînê re, ez ê jî bidim pey wan û çavên xwe blgir1-
155
1. Lê niha şîn et reş şîn e. De tu 'rabe û xwe bi. konê Temo Û Zînê bigihine û Temo Q lawê wi. bi xwe re. bine ..
Li ser gotina Evdal, Gulê û çend pîrejin, bi hev re çûn û Temo ... lawê WÎ yê nûbûyî, wergirtin û anîn
cem Evdal. Zarok digiriya û diklr qîrîn. Temo, rû bi ken, li dora xwe dtn1hêrî. Evdal pişta xwe dabû ber kevirekî û rûniştibû. Gulê zarok ani û da Evdal. Evdal ew hembêz kir, lê xwar bû. ew bîhn kir, destekî xwe 11 ser rûyê zarok gerand û ji rû û eniya wî maç kir.
- Xwedayo, bîhna zaytn û jîne JI lêwik dif'" re.
Evdal got. Bîhn e. xweş bîhn et nîşana tevgera dinê, hewalê merivan e. Xwedayo, ev çi îş e? Işê te ne -şê aqilan e. L' milekî tu zarokekî: didî me" li, milekî tu zarokên me JI me digirî. xezeba te li ser me ye. Ro hflattye, 11 her kesî hilatlye, lê li me hilnehatiye ... ,Ev çt dewr e, ev çi dewran e! .. Temo. lawo. bila siheta te xweş, ger û tevgera te bi heş be. Li min baş guhdarî bike. Gulê, mehrumê, hevalno, dosttno. şagirtmo, qedtrgmno ... Hûn bi çava dibînin. bi guhan dibihîsin. Bengîn çûye, Bengîn hatiye. Ro ava çûye. 'ro hûanye. Bengîn binax e, Bengîn li cem me. li serê Sîpanê Xelatê ye. Be gin mir. Bengîn veJiya .. ~ Eger we jî. mîna min. dil û daxwaz hebe û qebûl be. min navê vî mehrûmt, lawê Temo û Zînê, torinê min û Gulê. Bengin lêldriye. Bi hêviya ku ew
ndin b ..... """ j..... zir ....
ser şopa
e .. ~,& . e. mma WI rr u zane. . . av u
tenik, delal û çeleng, qedirgir û hurmetkar be... il tola Bengîn û axîna Tavbanûyê 11 erdê nehêle.

Gotina Evdall1 gora dUe Civatê' bû. Gulê û civatê. bi dengekl û bi qîrîn. gotin"
- Gotina te ye. Navê lawê Temo Bengîn e Bengîn namire. Bengîn û Meyro di îne. Bengîn namire ... Bengin nemir el
156
1
1
B
Gulê zarok ji hembêza Evdal wergirt, j:l çavên wî ramûsîn û paşê zarok da kalemêrê kêleka xwe. Kalemêr jî eynî tişt ,Ji eniya lêwik maç kir û ew da jina kêleka xwe JJnikêJî, eynî tişt kir. Herweha Benginê biçûk li ser destan geriya. JI hembêzê çû hembêzê. Ev tişt di nav bêdengiyeke boş de hate pê. Ji deng û qîrîna Benginê nûhatî pê ve, tu deng der-
nediket. Wekî ku civat Û şênî di nav tevgereke dinî de bû. Bêdengî pêl bi pêl fireh bû. Bi vi awayi, xelkê zarok bi dtya wî, Zînê. gihandin. Bêdengiya civat Û şêniyên Sîpanê Xelatê hawirdor jt dabû ber xwe. Ro, bêdeng, hildihat. Dar û ber, bêdeng. bi hêdîka, d1l1vîn. Bayê sibê, bêdeng, radibû, Quling. bêdeng, li kê eka Evdal. nikulê xwe li erdê dida. Şînê dest pê kmbû.
Evdal perda bêdengiyê disan xira kir.
- Hevalno .. ~ adet û ûsil, tarîx û zeman singê konê milet û welatan e. Bêbext û telaqreş dymlnê vî tiştî ne. Xelkê ku li vî tiŞtî xwedî derkeve, rûgeş e. xelkê ku lê xwedî dernekeve. rûreş e. Bila rûreşî JI me dûr, rûgeşt amanca me be. Li welatê me adet e, di destana Memê Alan de lê bûye, şîn bi darê şînê heye. Darê şinê dixemile û xelk, li şînê rûdine. Loma, de xwe bûeztntne, daranjêbtkine, b rengên kesk. sor û zer û rengê reş bixemilînine ... û hûn xortino, bengînên welatê mino ... hûn jî hespan hazir bikine. taxtman 11 hespan xtmne, darê şînê bi destê xwe bigmne û heta ro tê 1111 ser serê me disekine. hespan 11 ser û doraliyên Sîpanê Xelatê b xar dme, piştî ku ro di ser me re qultpt, hûn, bi darê şînê. xwe bi deştê berdine ..
1 reşa me, hawara dUê me bi welêt û allemê blgihinlne .. 4
Pişti pey1vina Evdal, tevgerek kete nav civatê.

Haho û girînê dest pê kir Hin J'1 xelkê. kom, bi kom, bi hin aliyan de çûn. Hinan li bin daran, 11 kêleka
157
kahn1yê cfh Û war hazir kirin û cil û kulav lê rax1stm. Ptrejinan gotin li gotm, bûyer li bûyer zêde kirin û hahoya şînê bi esman gîhandin. Dengbêj û stranbêjan dest bi stranên şinê kirin. Xort her bi Jêr çûn, alif û av dan hespan, ew hazir kirin. taxim lê xistin ...
Gulê. Temo. çend hevale Evdal û quling li ser serê Evdal bûn. Gulê cileki .1 hev pêçandibû 'Û li paşla Evdal danîbû. Evdal bêha bû. wî hinekî din.
mast vexwar - pariyek nan xwar wi Ji dostê xwe yê kêlekê xwest ku. ew Jê' re li bilûrê xwe. Dostê' wî, giran giran, li bilûrê xtst, Dengel 6 zîz. melûl û dirêj
ji bilûrê rabû û 11 dengan zêde bû. Dostê wî, 'bi bilûrê, ahenga şînê lêxist. Dengê bilûrê hê xelas nebûbû, Evdal serê xwe rakir, rûyê xwe ber b tavê kir û got,
- Gulê. mehrûmê ... dengê Sîpanê Xelatê di mêjiyê min de olan dide, rehm û qudreta S.îpa:nê Xelatê d.1 hundirê min de pêl dide Cavên min dêşme, gewriya min zuha bûye. denge min ketiye û şeve re şa min cîh li. min teng kiriye. Dilê min dibê. tu - hevalên 'vir min bi kevir û zinarê heri bilind ê Sîpanê Xelatê blgthîntne da ku 11 wir. ronahiya tavê û germiya royê Ji rûyê min xîne û ez. ji wir. dengê xwe yê ketî li hemû welêt blgthtntme. De rabe, tu û hevalên vir çêyiyeke din bi min bikine. . û quling ji bi xwe re bîntne,
- Evda10t bêhalo ... tu qey fahm nakî. tu bêhal it Gulê got Tu oikariji cihê xwe 'rabî û xwe bi dertna btgthtnt,
- Ou êt mehrûmê ... Evdal got û ê vegerand, lt min beyan bûye: ez divê bi kevirê btltnttrtn hOk1ş1me û bi hemû hêz û q weta xwe 1 ser siûda me stranan bibêjime. Eger tn1I1na min bi dilê we ye, fermo, min mebtne ... ez divê, her çijî be. xwe bi cihê bllintlrîn bigthîn1me ...
158
Çare nîn bû, wan ê Evdal bibirana. Gulê kete bin milekî wî. dostekî wî kete bin mllekî wî. bi hev re. ew hêdi hêdî, ber bi btlmdahtya Sîpanê Xelatê hilkişiyan. Temo jî. quling 11 hembêzê. da pey wan. Gava ku ew gihar

bilindahiyê, êdî hal di Evdal de nemabû û nefes, bi temamî, lê çikiyabû. Wan ew. 11 wir. 11 ser kulaveki, dirêj kirtn û Gulê. dîsan, rûnişt û serê Evdal danî ser çoga xwe.
Cih teht bû. 11 sere tu hêşmaht nîn bû û bi qasî gola serê Sîpanê fireh bû û warê teyrên mezin bû. Ji
wê derê. her ali dixuya û 11 btn lingan bû, ava Miradê pihêt diheI1kî. rê û xaçerê diketine nav hev û 11 dûr, pir dûr winda dibûn, g nd mîna kevirên xîç dixuyan û deşt, deşta bêser û bêber. hêşîn dikir. U 1"0 û tava royê, li ber wan bû û mîna agirekî çiki sor dişewitî û diblrlqî. Ro. niha. bi qasi çend bfhustên dtn, htlatfbû û hawirdor. 'bi ronahiya xwe", vegirtibû. Li serê dinyayê. kesî hê bergeheke weha xweş, weha aram. weha Ih evh atî, weha rengîn û weha germ nedîtlbii. Xweşiya hemû dinê li wir bû û It ber
çavan bû.
Lê çavên Evdal ev xweşî nedidît. Çavên wî vektrîbûn, lê dinya wî kor bû. Pişti bîskekê, wî, bi hêdîka, xwe ltvand. destê X\Ve da ser çoga Gulê û
.
rabû, rûnişt. Tava royê rûyê wi genn kir. QuUng Jî
xwe livand û qîre qîr kir. Li wir, tava royê û bayê sibê diketin nav hev û Evdal 11 yên din vedgandin~ Evdal Ji Temo xwest ku ew quling bidiyê. Quling nedihew1ya - deng dida. wî hewl dida perwazan jî. le her di hembêza Evdal de dima Evdal hêdî hêdi serê xwe zivirand û li dora xwe nihêrt weld ku wi tava royê didît û baye sibê hîs dikir ... Guhê wi 11 ser dengan bû. ReCeld teyran. bi wiçewiç, di ser serê wan re firiya. Jinekê JI nav koma Jinan navê Meyro, çendcar, got û nalîna şînê dirêj kir. JiJêrê:.
159
JI aliyê konan, hîrehîr bi hespan ket. Cend zarok, bi qîrîn. giriyan. Dengbêjekî ji dengbêjan navê Evdal bilêv kir û got, "malmîratê Egîd Begê dimire,
Evdal dimîne." Ji jêr. xuşîna ava Miradê xwe gihand dengê dengbêj.
wext hatibû.
Evdal destê xwe bir ber guhê xwe û bi hêdîka dest bi stranê kir. .
!Jê ... lê

...
lê~ ...
Bi gotina stra ê û bilindbûna dengê, gewriya Evdal vebû, hilm û nefesa wî veb - . wi rûyê xwe û çavên xwe ber bi royê û tîrêjên tavê kir û got..
Bi strana wî. dengbêjên din sekinîn, pîrejinan dengê xwe birin. xortên ku li ser hespan bûn. serê xwe dirêj k1rtn û ber bi dengê Evdal zlvttin. Dengê Evdal, dîsan, doralî vegirtibû. pêl bi pêl, xwe bi her deri gîhandibû; awtr hişyar kiribûn, teyr fira .dibûn, dengê bllb ... û şalûran birtbû, dar û ber û giya livandibû, av û. kahnî bi pêlan rakJrtbû.
çerxa felekê jî. 11 Evdal hukim nekiribû. Heyecan, coş û kela Evdal rabûbû, Evdal hişyar bûbû, JI nû ve. xwe dîtibû. dengê xwe peyda kiribû. Dengê EVdal" 1 ser Sipanê Xela. ê, 11 nav zinar OA çiyan, di bin gelî û newalan de. U seranserê deşta ku li ber lingan. olan dida. Deng. pê bi pêl, helqe bi helqe, fireh dibû, bilind dibû il xurttir dibû. Herkes şaş mabû, Evdalê ku 11 ber mtnnê bû, niha, bi dengê
xwe. miri ji qebr ~ goran rad1k.1r.
Evdal bi stranê re ç1lb'"
Ew çûbû d1yareki din,
dinyayeke din. Li tore, 11 btlmttrtn cihê S-panê Xe atê, Evdal dlheriki. LI Jêrê, li ber lingê Sîpanê
Xelatê, av û kahnî diherikî. Roya ku li hember Evdal bû. firehtir, sortir, germtir dibû. Gennahiye-
160
ke boş bi ser Evdal re hatibû. reh û damarên wî ûreh bûbûn. Dilopên xwîdanê li ser eniya wî, rûyê
wî, qirika WÎ. canê wî clv yabû Xwîdan jê diçû. Destê 'WÎ. radibû. A. Ew 'bi firê ketibû, ew 11 ser ewran bû. Ew heft qat li ser esmanan bû. Bask û perwazên wî û qultngê şîn hatibûn - ew bi hev re firtyabûn.
'Ew Evdalê ku bi qasi kulmekê mabû" niha bûbû fêrişte. Sîpanê Xelatê bûbû gewriya wi. deşt bûbû devê wî, lehî bûbû dengê WÎ. Ew bêhed û bêhudûd. ez! bûbî
mezin ',U 'u,

Ouhdar û, xwendevanên delal, ew ecêba ku niha mesela çîroka me ye. ew ecêba giran. hingê. li wê derê, 11 spêda welatê Kurdistanê û 11 serê çiyayê Sîpanê Xelatê qewimî, şevereşa Evdal winda bû, perda taritiyê qeltşt, bextê reş lê qulipî. .. Çavên Evdal vebûn ... Pêşî, bi qasî mtstekê ronahî bi çavên wi ket. wi pê bawer nebû. B:i wî welê bû 'ku germahiya canê wi leylan lê didayê. Lê paşê. ronaht hêdî hêdî ftrehtrr, kûrttr û xurttir bû. Tartya şevê çû,
şewq û ronahiyê çavên 'wî tiji kirin. Niha her der', hawirdor di nav şewq û ronahlye e ecêb de bû ... Her ali ro ... bû. her cîh spî bû. Ronahî pêl bi 'pêl bi ser
Evdal re dihat. Evdal newêribû çavên xwe bigirta. Evdal dmrstya xwe biltvtne û bizivirine. wî her li, hember xwe. 11 ronahiya 'royê d.inihêri ~ stran digot,
Kesi fahm nedikir ka çi dl~'" . Evdal jî xwe ned1 .. zMrand. Dengê Evdal her kes mat ~ sersem kiribû. Evdal, niha, stran qulipandibû ser ronahiya tavê û roniya çavan. Ronahiyê zora reşahiyê biribû .. Hingê G ê û dorall fahm, kirin ka çi dtqewtmt. Hingê Gulê da tllDîû çepikan. Hinge heval û dost 11 Evdal civiyan 11 ew hembêz kirin Hingê Evdal got.
- Ronahî ye, xweş ronahî ye. Ji ronahiyê xweştir tiştekî nin e. Gelî hevalan ... bi dinê ... allemê
'161
btgthtntne, ronahiyê zora tariyê btrtye û şewqê reşahtya şevan bi ŞÛ'D de xistiye.
Lê belê, hê tiştine hebûn ... Ecêba gtran, bi tenê,
bi, ronahiya royê û bi vebûna çavên Evdal nedtqediya. Quling jî dest 'pê kiribû û xwe dtltvand wi pihêt, pir pihet, dida bask û perwazan.i. Gulê û heval hê bi Evd,al re dtpeytvtn, ,Ji nişkekê 've. tiştekî din qew1nû; quling dest bi firînê kir, .. Q ling difiriya. Qult,ng dida perwazan. Baskên quling cebmbûn, Quling dixwend û difiriya Û Evdal Ji. bi
çavan, lê dmthêrt .. ,.
Ew tişt. ku U Evdal beyan bûbû. niha, qewimîbû.
Ro ah- 1 Evdal vegertbu. bask 11 quhngê şîn hat bû. Evdal dida çep " a ... , 11 quling dtnthêrt

Quling 1 ser serê Evdal difmya. E\v ber bi j êr û 'ber bi Jor dibû. li ser teht dizivirî. Paşê. ew ber bi esma .. nan firiya" çend car 11 wê derê, zrvirt û doş 'bû, û ji
- .... berê d tvatê ~ ... ê
r ,W1 ere xwe ra c " e u şme,
Gava ew bi civata Ş'''' 'ê gthtşt. ew nizm bû û di ser ctvatê re firiya. Xelk û şênî, bi ecêbi, 11 jor nihêrin. Qulingê ku difiriya. qultngê birîndar û baskşikestî bû .. Xwedayo, baskên \VÎ cebtrîbûnl Ew difiriya 0.
dida bask û perwazant ..
Ptştî ku qultng, bi dtrêjahiya bîskekê. li ser
civatê firiya. ew, disan. ber bi jor bû. Niha ew li ser golê. gola spî difiriya. Ew baş, pir baş. ber bi jor bû û ji wtr.] nişkekê ve, X\Ve bera jêr da û hate, noqî ava golê bû. Cend car weha, ew ber bi Jor 'bû û hate, noqî avê bû ... Avê pêl da. Pelên, avê X\Ve bi civatê gîhandin~ Xelk 11 şênî rabûn ser piyan Û 11 vê eceb! nihêrin û, bi ava golê ku pir sar bû, dest û rûyê xwe şuştin.
Quling. Ji wir Ji, disan, ber bi Evda firiya û hate . i ser serê Evdal ziviri' û kir qîrîn ... Evdal dike-
niya... Gulê dikeniya. ~ tl Temo dikeniya û Il çepikan
162
w
i
J
dida ... Dost û heval dikeniyan ... Xelk û şênî dike-niyan... Quling ji. bi qîreqîr. difiriya.
Quling firiya. Ew bi qasî xwe û têra xwe firiya Û paşê, ew li ~dal zivirî û xwe 11 Evdal girt û hate 11
ser çoga wi ventşt Evdal dikeniya ... Gulê dike-
niya. Temo dikeniya Xelk û şênt dJken1yan
Herçi em in. Ji me re ji hew gotin ma ....
163
164
PIRTÛKEN ME YÊN KU DERKETINE

A.S. Pûşkin I KEÇA KAPITAN/Ro'man
'. A.P. Çêxov / MIRINA KARMEND/Novel
Hesenê Metê (Niv1sende) I ARDÛ / Ji çîrokên gelêri
Redwanê Ali / TILûRÊ BÊGANE/N'ovel
Hesenê Metê ,/ SMIRNOFF I'Nove1
Mûsa Anter I HATIRALARIM/Bîranîn
***
PIRTÛKÊN ME YÊN KU DERKEVIN
* F. Dostoyevskî / MERIVÊ REBEN/Roman
Hetnrtcii BOll / HERIMANDINA
JIYANA KAnIARINA BLUM/Roman
Adresa xwestinê:
Weşanên Welat
elo KFH. Box: 4088
141 04 Huddinge/Swêd
WÊŞANÊN WELAT
a Kalekî Rind
ROMAN

ROMAN

Pirtûkên ku Wêşanxana Orfeus weşandine ev in:
1 -Kiirt Ulusal Hareketleri ve Ermeni-Kurt ilişkileri, 1986
2 - Mirina Kalekî Rind, 1987
3-ÇtrokênKurdî, 1987

MEHMED UZUN

SEROK ALTAXUS

Laleş Qaso

KomaL
Weşanxane: KomaL
Wêneyê bergê: Behzad Tara
Çapa duduyan: 2009

BEŞÊ YEKÊ

”Min ji tunebûnê hûn afirandin;
kirin insan û şexsiyet da we!”
Serok Altaxus

Şêrgele

Çêlek oriya. Rojên eskeriyê hatin bîra wî. Jinik qeliqî. Wî bi qehr li seetê nerî. Seet tam nehê şevê bû. Wî hîn li seetê dinerî, çêlek dîsa oriya. Û bi ser de jî bi dengê xwe ê herî bilind. Mêrik bêhemdî xwe çengî wê navê bû û mîna hêlanê çû û hat. Zarok nuh xilmaş bûbûn. Yek ji wan veciniqî û hema di cihê xwe de rûnişt. Lêwik mîna dînan li çep û rastê xwe nerî. Dû re qîq sekinî. Bi xwe şiyar bûbû. Li ber xwe ket. Xwest ku bigrî, lê wê guh lê nekir û wek keroşka ku ji mexel rabe, bêserî bi wir de pekiya. Devdelingê wê li tasê aliqî. Tas tije av bû. Li tasê ne sekinî.

Nepeyivî jî. Xwas da devê derî û bêyî ku tiştekî bibêje bi wê lez û bezê ber bi êxur de reviya. Lêbelê dîsa jî fêde nekir. Mêrik dabû nav û gotina xwe a her tim çar carekî jî gotibû: ”Howeh ji destê min û vê jinikê û vê çêlekê! Kuro mirov dibêje qey herduyan hevdu şîret kirine û a xwe li min kirine yek. Bêxwedîmayê ku hema deqîqeyek bi ser seeta êmê wê dikeve û pêjna jinikê li êxur neke, qiyametan radike! Wilo nabe, ez ê yan wê bikujim û yan jî wê teslîmî hevalan bikim…”

Dengê orandina wê dişiband borîzana tabûra ku lê eskerî kiribû.
Ber bi sobeyê de meşiya. Sobeya ku ji agirê qurman sincirî bû, di nîvê odeyê de bû. Xwe bi ser menqelê de daqûl kir û li derdora wê nerî. Carûd nedît. Pişta xwe rast kir. Keserek kişand û li zarokan nerî. Hersê zarok jî razayî bûn.
7
Çong berdan erdê û bi qasî ku serê xwe têxe bin menqelê xwe tewand. Di wir re carûda ku li ber tifika sobeyê bû dît. Rahişt carûdê û li ber tifikê li ser qerevîzkan rûnişt. Pizotan di sobeya devvekirî re mîna kevirên hêtûnê xuyanî dikirin. Wî carûda xwe di nav wan re rakir û bi lez carûd valakir menqelê. Piştî ku bi wî haweyî menqel ji pizotan dagirt, bi maşikê pizot ji hev vepexirandin. Ev agirê wî ê dawî bû û wê xwelî bi ser pizotan dakira. Lê pizotên ku ji qurmên darên berû û girs bûn ji hev nediketin û di menqela wî de rast nedibûn. Menqel qey hinekî ji hêlîna qijakê mezintir bû. Bi maşikê li wan da. Li wan da, lê bi haweyê şivantiya xwe a demekê li wan da. Bi derba wî a duduyan re pizotekî bi qasî kabên beranan pekiya pişta stuyê wî û di wir re jî hema xwe bi nav pişta wî de berda. Bi xirecir û qîjewîjê û mîna hirçan li wê navê çû û hat û xwe li erdê da. Lê derbê carekê cihê xwe girtibû. Pizot bi çerm ve zeliqî bû, canê wî ha ha dişewitand û jinik jî hîn ji êxur venegeriyabû. Heger vî mirovê wek bertelaşekî navrana şerwalê xwe ê ku bi pizot re bûbû yek vekiribaya, yan jî pizot di nav cilên xwe de hişk girtibaya, ji sedî sed wê ne canê wî ewqasî şewitîbaya û ne jî orandina gayekî pîr jê hatibaya. Di dawiyê de

pizot bi destan zeft kir û virikî avêt. Avêt lê avêt cihê herî
xerab. Ew bi êşa canê xwe daket û pizotê ku li ser lihêfa
zarokan ketibû jî, ha ha lihêf dişewitand. Kî dizane heger
deng bi deriyê hewşa wan neketibaya, jinik bi bazdanê derbasî
hindurê malê nebaya û dixana ku ji lihêfan bilind
bûbû ferq nekiribaya, belkî zarok jî şewitîbana.
Mêrikan mîna eskerên ku xeta mayinan diparastin diqê-
8
riyan û bi kulm û pê û lepan li deriyê tenekekirî dixistin.
Dengê hirmegirma wan di ser serê gund re derdiket. Lêbelê
jinikê jî şîqeşîqeke wilo li hindur rakiribû ku heger li
derve top biteqiyana jî wê dîsa deng neçûbaya Çolo. Jinika
ku guhekî wê li ser mêrê wê û yek jî li ser şêrgeleyan bû,
piştî ku bi wî haweyê xwe tibabekî bir, hilmekê fikirî.
”Şêla wan xerab xuya dike. Heger em derî ji wan re
venekin, willehilezîm ew ê derî ji serzîlan de bixînin û bên”,
ji xwe re got û hema lempe tarî kir.
Dû re jî bi bayê beza xwe re ji mêrê xwe re, ”kuro hin
li deriyê hewşê dixînin”, got û bi bez ji hindur derket.
Çawa ku derket wilo jî xwe da ber stûna sefirneyê û li wan
guhdarî kir.
Niha êdî ew tam nas kiribûn. Xwe giran kir. Lê wê çiqasî
xwe giran kir, wan ên din jî xwe ewqasî sivik kir, tirovirî
peyivîn û li derî xistin. Jinikê dîsa deng ji xwe dernexist.
Lêbelê piştî ku yekî ji wan got:
”Hevalino, niyeta vê malê xerab e, dengê me diçe wan
û ew jî naxwazin derî ji me re vekin. Xwe bidin ser hev da
em di ser sêncê re biqevizin hewşê”, jinik pêrgî wan çû û

dengê xwe rakir:
”Waweylê, waweylê, waweylê, li min qirikê heval li derî dixin û hayê me ji wan tuneye! Di vê qir û seqemê de kî zane niha bê ji kengî de li ber derî sekinîne!”
Bi dengê wê re deng ji şêrgeleyan qut bû. Hemû pênc kes bûn. Sisê ji wan girs bûn. Lê yek ji wan ji Çolo jî girstir bû. Qama wî belkî zêdeyî du metreyan bû. Çolo dêw bûm, lê ew zir dêw bû. Ev Dimdimê têrî bû. Bi hevalên
9
xwe ve gelek caran li vê malê qesidîbûn; xwaribûn, vexwaribûn û razabûn. Sînemê ji birayê xwe jî bêhtir jê hez kiribû. Kincên wî şûştibûn, dirûtibûn û pîne kiribûn. Kêfa zarokên wê jî pir jê re dihat. Lê wî jî bi xwe re car carê şekirên qulqulkî û qidam ji zarokên wê re dianîn. Carekê jî ji Bintêlê çend gaz şîfon û libadeyekî helebî ji Sînemê re anîbû.Destvala bi ser de nedihat.
Dimdim bi G3 û arpicî û ên din jî bi keleşkof bûn.
Digel ku li ber deriyê hewşê têra xwe sekinîbûn jî, mîna ku ji şevbihêrkê hatibûn wilo bi kêf û eşq xuyanî dikirin. Navê westanê bê çi bû li dor wan peyde nedibû. Solên wan jî ne bi herî bûn. Yekî ji wan wek ku henekên xwe bi Çolo dikir. Bi mirov wilo dihat. Lê dinerî û di bin boqên simbêlaran re yekliban dipijirand. Lê piştî ku çavên Çolo bi ên wî ketin, hema serê xwe berda ber xwe û wek şikêrekê li ser qerevîzkan di cihê xwe de sekinî. Xuya dikir ku Çolo jî di wî haweyê wî de derxistibû. Ew hawe ne ecibandibû, lê tiştek jî li xwe çênekir. Ew bi ên din daket û wek hudhudk li ber destên wan çû û hat. Şêrgeleyên ku vê carê hatibûn

mala wî, ne wek ên tu caran bûn. Di her cara ku şêrgele li
mala wî dibûn mêhvan, di hindurê malê de mîna gêrikê
diçûn û dihatin. Mirov digot qey xwediyê malê ew bi xwe
bûn. Lêbelê ên niha qet ne wilo bûn. Sisê ji wan wek camêran
di cihê xwe de rûniştibûn û li bendî bê ka Çolo wê çi
ji wan bipirsiya, kemlan sekinîbûn. Lêbelê şêla duduyan jê
ji hew bêhtir bala mirov dikişand. Herdu jî çarmêrkî rûniştibûn
û bi haweyê ku Çolo mirovekî pir mezin bû lê dinerîn!
Heger kebaniya wî çayê zû nedaba destên wan, kî diza-
10
ne belkî heta bi dawiyê wilo bêlept sekinîbana û ha ha ji
xwe re lê bineriyana. Çolo ew yeka han ferq kiribû. Di ruyê
wî de xuyanî dikir. Ruyê wî mîna lempeyekê pêketibû.
Temenê wî li derdora çilî bû û bi vê edeba niha tu kes li
himberî xwe wilo nedîtibû. Him bi ser de jî ên ku li himberî
wî bi edeb rûniştîbûn, li gora wî, di dinyayê de bi dû
Serok Altaxus de mirovên herî mezin dihatin û wan mezinan
jî xwe jê re kiribû erd. Heger baskên wî hebana miheqeq
wê ji kêfan re firiyaba! Lê çi fêde kebaniya wî wek keleka
li ser avê habela bi vir de û wir de diteriqî û bala hemiyan
dikişand ser gotinên xwe ên bi wate.
”Sînemê, gelo te ker jî êm kiribû?”
”Erê.”
”Û golik?”
”Min heywan hemû yek bi yek êm kirine, heyran”, got
û berê xwe ber bi şêrgeleyan de vekir.
Lê Çoloyê ku hîç kum nedabû serê xwe, rê nedayê.
”Min kumê xwe li êxur ji bîra kiribû, here kumê min

bîne.Here!”
Sînemê di ber xwe de beşişî:
”Çêlekê kum cûtibû û min jî ew avêt.”
Xeberdana wan a bi wî rengî li hesabê şêrgeleyan jî
nehat. Çend kesan ji wan serê xwe berdabû ber xwe û xwe
bi ser hev de diguvaşt. Di dawiyê de yek ji wan bi hemd
rabû ser xwe û bi haweyekî kubar ji Çolo re got:
”Hevalê hêja, heger tu aciz nebî, ez dixwazim bi te re
hinekî li derve bipeyivim.”
Çolo jî hema rabû ser xwe ”li ser herdu çavên min
11
heval”, got û tena tena ber bi derî de meşiya.
Şêrgeleyê ku bi sol rûniştîbû zû ji hindur derket. Çolo
jî hema wilo xwas da dû û heta bi hewşê çû. Mêrik ji bin
sefirneyê bi hêdî gazî wî kir:
”Heval, were vir; em li vir jî dikarin bipeyivin.”
Çolo bêyî ku dengê xwe bike, bi lez xwe gihandê û serê
xwe ber bi ê wî de tewand:
”Heval, kerem bike ka bê tu ê çi bibêjî?”
”Heval, silavên Serok Altaxus li te hene!”
Bi gotina wî re Çolo veciniqî!
”Çi, çi çawa?” got û wek pelê çilo lerizî.
Pişt re jî hema pê re dest û lingên wî mîna rêsiyekî li
hev geriyan û di cihê xwe de rûnişt. Ê din ew haweyê wî
ferq kir, lê tiştek jî li xwe çênekir; xwe da tengala wî û li
ser qerevîzkan çong berdan erdê:
”Erê heval, Serok Altaxus ji dil û can silavan li te dike
û nameyek jî ji te re şandiye”, got û bi gotina xwe re name

dirêjî destê wî kir.
Çolo rahişt nameyê. Lê çawa ku destê wî bi nameyê ket, wilo jî hinavên wî bi ser hev de keliyan û kelecana wî zêdetir bû! Mîna ku destên wî di ên Serok Altaxus de bin, eşqekê pê girt, dilê wî bi wê êşqê re fûriya û devê wî ket hev.
Heger pişta wî ne li dîwêr ba, wê ji sedî sed li erdê veziliyaba.
Mirovê şêrgele êdî baş fêhm kiribû ku Çolo çiqasî heyranê Serok Altaxus bû. Nexwest gotinê dirêj bike. Ji nişkê ve rabû ser xwe û hilmekê lê nerî. Dû re ew bi herdu destan ji milan ve hejand, ”heval, nameyê zû bixwîne û xwe kar
12
bike”, got û derbasî hindur bû.
Çolo bi tena serê xwe qederekî baş li wê navê ma. Heger jina wî pê ve nehatibaya û bi dengê wê re li xwe newerqilîbaya, kî dizane belkî di wê rewşê de li wir qerisîbaya jî.
Piştî ku ji jinikê re got, ”here ba mêhvanan, ez ê bêm” û jinik jî çû, wî xwe li êxur girt. Lêbelê axur reş bû. Lingdan li hindurê malê vegeriya. Bêyî ku ji jinikê bipirse, çira zû dît û bi lez dîsa çû êxur. Jinikê da dû.
”Kuro, ev çi hewala te ye? Tu li êxur li çî xwe digerî?”
Çolo wek teyrekî xwe dadayê, ew ji newqê ve zeft kir û devê xwe tam xist qulika guhê wê:
”Hişşş, dengê xwe neke, derkeve û hew!”
Jinikê hîn bêhtir mereq kir:
”Erê ka bêje bê mesele çî ye, belkî ez karibim alî te bikim.”
Vê carê jî bi pêxêla wê girt, kilkiland û got:
”Keçê Sînemê, ez ji te re dibêjim ku dirêj neke; zû ji vir

biqeşite, weh!”
Sînemê dirêj nekir; bêhis û pis û bi yek tûşê re çû. Çawa ku ew çû, wî jî hema name ji paşila xwe derxist û da ber ronahiya çira ku di dîwêr de li ser refikê bû. Name hemû çar rêz bûn, her rêzeke wê bi qasî sê rêzan mezin û navê Serok Altaxus jî ji hersê rêzan mezintir bû. Tîp bi haweyê ku zarokan jî bikarîba bixwendana bi rêk û pêk hatibûn nivîsandin. Çolo di xwendina wan de hîç zehmetî nekişand; heta bi cara yazdehan jî wek avê lê çû. Lêbelê di xwendina wî a cara duwazdehan de, devê wî sist bû û mîna qayişa êş reqereq bi argûşkên wî ketin. Dû re bi haweyê ku bi cezmê
13
bikeve habela lerizî û di cihê xwe de rûnişt. Canê wî giran bû. Rûniştin pê xweş hat. Xwe bi ser hev de guvaşt. Guvaştinê lerza canê wî hinekî daxist. Çavên xwe li derdora xwe gerandin. Derdor di çavên wî de mîna pêlên hewrên reş û tarî di ser hev re diqulipî. Xofê ew girt, lê xwe winda nekir. Ji nameya ku mîna rûpelekî Quranê li ser kefa destê xwe danîbû xuya dikir ku hîn jî dikarîbû bifikirya. Di wê rewşê de piştî ku bêhnekê li erdê ma, hema rabû ser xwe û mîna dizan li vî alî û li wî aliyê xwe nerî. Her derê jê bi sahw xuyanî dikir. Çitikî sekinî. Ji kûraya kezebê keserek kişand. Bi vê keserê hinekî bêhna wî derket. Meşiya. Lê du gavekî neçû, pişta xwe da dîwarê ku çira li ser refikê bû û hêdî bi hêdî nameya xwe ber bi ronahiyê de bilind kir. Vê carê name nexwend, ziq li tîpan û rengê ku tîpan bi kaxeta lewitî xistibû nerî. Wî çiqasî li wan nerî, ew jî ewqasî jê dûr çûn û mîna stêrikan çirûsk vedan. Heta vir jî bêhis û pis û

bêlept sekinîbû. Lê piştî ku navê Serok Altaxus di rengê heyva nîsanê de ronahî dayê, kil bû, şewişî û barînî pê ket. Bi dengê barîniya wî re weş li heywanan ket û hema pê re jî ker ziriya. Bi zira kerê re tam bi xwe şiyar bû, sivik sivik name di diruvê niviştê de li hev pêça, sê caran li ser hev maçî kir, xist bêrîka xwe û bi lez û bez derbasî hindurê malê bû.

Dema ku Çolo derbasî hindurê malê bû, kebaniya wî jî mîna ku bavkujtiyên wê li hindur rûniştîbin, pişta xwe dabû şêrgeleyan û wek piştiyekî hejikan xwe di qorziya xênî de vepelixandibû. Bêhna Çolo teng bû û bêyî ku ji kesî re tiştekî bibêje li wê navê bêserî hinekî çû û hat. Dû re jî li

14

nêzîkî kebaniya xwe wek darekê sekinî û ziq li şêrgeleyan nerî. Şêrgeleyan jî hişk bi sîlehên xwe girtibûn û wek guran çavên xwe li hindurê malê digerandin. Heger Sînemê şêrgele bi şîv kiribana û her çiqasî pişta xwe bi wan vekiribaya jî, di wê kêlîkê de belkî Çolo jê ewqasî nehatibaya bêvilê û diranên xwe lê ne seqandibana! Ev ne cara pêşî bû ku Sînemê bi vî haweyê niha kiribû. Di eslê xwe de Sînemê jineke çavfireh bû. Her kesê ku li mala wê diqesidî, destvala ji mala xwe venedigerand. Xwe ji mêhvanan re dikir erd; ji devê xwe û zarokên xwe derdixist û dixist devê wan. Heta jineke wilo bû ku dikarîbû çêleka malê ji wan re biguranda. Îcar gava ku şêrgele dibûn mêhvanên wê, pir çavteng dibû û mîna niha bi şêrgeleyan re dikir. Û heta carina ji a niha jî xerabtir bi wan re dikir. Çolo ji hew bêhtir jê hez dikir, lê ji ber vî haweyê wê jî carina xwîn jê vedirşiya.

Çend carekî dilê xwe li kujtina wê xerab kiribû. Mêrik carekê li ser mirîşka ku kurk ketibû û ji şêrgeleyan re gurandibû û jinikê jî ew yeka han bi xwe ne xweş anîbû, hema mabû ku jinik kujtibaya. Lê cara ku herdu bizinên xwe ên şîrek li çiyê ji şêrgeleyan re gurandibûn, ne ji gundiyan ba, ji sedî sed wê jinik kujtibaya. Ji xwe piraniya pevçûna wan li ser wê alîkariyê bû. Çolo dîn û îmana xwe ji şêrgeleyan nas dikir û Sînemê jî ji bilî Dimdim, bi çavên minafiqan li şêrgeleyan dinerî.

Çoloyê ku wek tivingeke dagirtî bû, berê xwe da Sînemê. Lê şêrgeleyê ku ew xewle kiribû nehişt ku pê de biteqe.

”Hevalê hêja, zû xwe kar bike da em bi wext ji gund

15

derkevin. Rêya me pir dûr e”, got û bi keleşkofa xwe lîst.

Çolo gotina wî nekir dudu; mîna dînan bi vir de û wir de çeng bû û got:

”E e e, hema hi ihi, erê…”

Li kincên xwe digeriya. Lê ji şelepela ku rakiribû rê nedibir ser tiştekî xwe. Di dawiyê de berê xwe da Sînema ku awir tê de difirandin:

”Keçê rabe bi min ve, weh!...”

Sînemê bi wehc pê ve rabû; çawa ku rabû wilo jî mîna rêsiyekî xwe li dest û lingên wî gerand û bi hêrs jê re got:

”Çolo, ez vê yekê ji te qebûl nakim! Nabe ku tu van zarokên hûr û mûr di stuyê min de bihêlî û derkevî çiyê. Ez ê van zarokan çawan bi xwedî bikim? Ez jin im û jina bê mêr jî nav tê ser. Hinekî ji xwe fedî bike û min û zarokan bi tenê bernede.”

Vê carê jî berê xwe da şêrgeleyan:
”Ma ûjdanê we çawa tahmûl dike ku hûn wî ji nav me dibin! Halê me pir nexwş e. Em bi tayekî xav tên xeniqandin. Ez ji bo zarokên xwe li taştiya sibehê, firavîn û şîvê dimînim heyirî. Me bi xwedî bikin û hûn wî bi ku de dibin bibin...“
Şêrgeleyekî bi zirt gotina wê birî û tiştên ku Çolo tu carî jê re negotibûn, jê re gotin:
”Bênamûsa heram, bes e! Gendelê, ma welatek mezin e yan zarok marokên te, mezin in hi? Zarokên her kesî hene, kurd hemû feqîr in, tirê! Her tiştê xelkê ê partiyê ye; zarokên te û heta tu bi xwe jî jina partiyê yî!“
Sînema ku him jineke mêranî û him jî têra xwe çavve-
16
kirîbû, jê danexwar. Herdu destên xwe mîna du şûran bi ser de hejandin û bi wî dengê xwe ê têranî kişiya ser:
”Teres, bes zimanê xwe dirêj bike, ez çawa jina partiyê me! Ez jina wî sermezinê ha me. Zarokên min ji welatê te û bavê te û partiya te jî mezintir in. Qeşmer, ma ne bi van zarokan tu bi wan kafirbavên eskeran re şer dikî! Welat bi zarokan welat e!”
Ê şêrgele xwe jê xerabtir kir. Bi qehr rabû ser xwe:
”Puşta jinan“ got û xwe lê girt.
Hevalên wî ew zeft kirin:
”Heval Dûpişk, niha dev jê berde, em ê dû re bikaribin derza wê bidênê. Heqê wê kujtine!…“
Sînemê xwe bi ser hev de gij kir, ber pê de çû û qîjiya:
”Ma çima qey ez qeh bim ku hûn ê min bikujin? Mirov

jina qehp û mêrê qewad dikuje!“
Çolo gotina wê birî; ji hêlekê ve bi qehr destê xwe danî ser devê wê û ji hêla din ve jî bi haweyê ku ber bigire, mîna parsekan bi şêrgeleyan re peyivî:
”Hevalino xem nake, xwe nekin wek wê; ew hinekî dînikî ye. Her roj karê min û wê ev e...“
Lê Sînema ku bûbû pizot jî wek dînan qet nedipeyivî. Bêwestan peyvên aqilane dikirin. Heger di wê navê re hersê zarokên wê bi hev re ne giriyabana û tev li Çolo şêrgele hemû ji hindur derneketibana, dibû ku wan û wê derbin li hevdu xistibana.
17
Şeveke zivistanê bû. Mij û moranê girtibû her derê çiyê. Hewr bi ser hev de dikeliyan û ber bi başûr de diherikîn. Şev mîna qîrê reş xeriqî bû. Bi dengê belediyan re erd û ezman dilerizî. Çarhawêr gur dizûriyan û hemiyan jî wilo bêhnteng ji gund dabûn rê. Ji destê wê bêhntengiyê heta bi nan û mewîj û bastêqa ku divabû bi xwe re bibrana jî, ji bîra kiribûn. Tew bi ser de Çolo bîr nebiribû ku benên çaroxên xwe girêbidana. Qapûtê xwe ê wek kurtanekî şivankî avêtibû ser milên xwe û ji hindur pekiyabû. Rêya wan dûr bû, rê di newal û çiyan re diçû û bi ser de jî şev pir tarî bû. Divabû qonax bi qonax çûbana. Lê Serok Altaxus wilo emir kiribû; mecbûr bûn ku di sê rojan de bintêl bûbana û ji wir jî hema teqeze xwe gihandibana Keleha Mezlûman.
Çolo di rêwitiya mîna eva niha de xwedî tecrûbe bû. Di xortaniya xwe de him nîv feqetiyek kiribû û him jî bi

qaçaxçiyan re çend carekî derbasî Bintêlê bûbû. Dema ku li hin gundên deşta Diyarê Bekir feqetî dikir, sê caran ji Têrê û heta bi wan deran peya çûbû û hatbû. Niha wî nedixwest ku ewqasî bi lez û bez çûbana. Lêbelê hevalên wî bêwestan dilezandin. Hîn du seetekî nemeşiyabûn helke helk li hemiyan ketibû, dişewişîn û diçûn. Bêhna wan ji a li gund tengtir bûbû û ha ha geft li Sînemê dixwarin. Sênga wê jina deqarû, di çiya, newal, şewl û guherên Têrê de dabûn ber devê gîsinan û dixerimandin. Çolo jî nedabû ser şûva wan, di xeta cohtê xwe re bêhis û pis û bi cezma Serok Altaxus dimeşiya.

Di nav wan de ê herî hûr û ciwan Dûpişk bû û ew

18

mezinê wan bû. Dûpişk hîn bîst salên xwe temam nekiribûn. Li Hîlwênê mezin bûbû û bi tenê xwendegeha seretayî xwendibû. Ew jî xelas nekiribû. Li gora Çolo û hevalên wî qisûra Dûpişk a ber bi çav, sîrqûniya wî bû. Di mêrik de gotinek nediçû. Kê ji wan çi digot wî jî hema singek pê ve dikir. Çolo jî mîna ên din hinekî jê aciz bûbû.

Jê tirsiya bû jî. Heta ku jê dihat dûrî wî dimeşiya û xwe ji xeberdana pê re vegirtibû.

Şêrgeleyan li ser daxwaza Dûpişk bi rê de çar caran bêhna xwe vedan û di herçar caran de jî heta ku bi rê diketin xeberdana wan herwiha li ser Sînemê bû. ”Wê gunehkarê”, jê re wilo digotin, mîna kwînêrekê xwe berdabû ser dilê Dûpişk. Heta çend carekî di ber xwe de gotinên ku mêr dikarîbûn li ser bihatana kujtin bi jinikê re kiribûn. Ji bilî Dimdim deng çûbû ên din hemiyan, lê yekî jî li xwe

neqewimandibû.
Bi sariya sibehê re herêma Têrê li pişt xwe hiştin û derbasî herêma Omarê bûn. Di eslê xwe de divabû wan di du seetekî de xwe gihandibaya vê herêmê. Tev li Çolo hemû jî ji hawhaw de ketibûn. Ji her derê wan xwêhdan û av dinisilî. Xîzexîza gayê ber coht bi hemiyan jî ketibû. Hindik mabû ku Dûpişk li ser qûnkişkê bi rê ve çûbaya. Di dawiyê de Dimdim ket bin milê wî û meşiyan. Lê bi wî haweyî jî nebû. Piştî ku çend mişarekî çûn, berê xwe ji ser rê dagerandin û xwe rast li gundê ku hema di binya wan re bû girtin. Dimdim her çiqasî ne serkêşê wan bû jî, bi a wî dikirin. Baweriya hemiyan ji hew bêhtir pê dihat. Ew ê rojên
19
qewamê bû. Ji destê wî dîtibûn, dizanîbûn bê Dimdim çi nihîtê neqaban bû! Hemiyan jî ew ji xwe dirustir, jîr û zana û mêrxastir didîtin. Lêbelê Çolo ji hemiyan jî bêhtir bi çavekî mezin lê dinerî. Xwe pê serbilind didît ku herdu ji herêmekê bûn.
Dimdim û hevalên xwe çawa ku xwe berdan gund, wilo jî gundî hatin pêşiya wan û li wan vehewiyan. Ji xwe karê van gundiyan ev bû, her gava ku xerîbek dihat gund, mîna ku qirdik dihat, her kesî dev ji kar û barê xwe berdida û di cih de lê kom dibûn.
Dimdimê ku wî û muxtarê gund ji zû de hevdu nas dikir, rast berê xwe da mala muxtêr. Muxtar jî bi xweş û bêş pêrgî wan ve çû û ew li mala xwe kirin mêhvan. Muxtar mirovekî zirav î dirêj û kej bû. Şêst sal kiribûn. Ew û jina xwe û keça xwe bi qedir û qîmet ha ha li ber destên

wan çûn û hatin. Du lawên wî jî bûbûn şêrgele. Lê yek ji wan li derdora Mezra Botê hatibû kujtin û termê wî jî winda çûbû. Partiyê ji wan re wilo gotibû. Dê û bavê wî ji kujtina wî bêhtir li ber termê wî ê windakirî diketin.
Ji ber ku şêrgeleyan her tiştê gundiyan wek malê partiyê bi gundiyan dabûn qebûlkirin, di guherandina kincên xwe de tu serêşî nekişandin. Gundiyên ku hînî emirê wan bûbûn, di hikmê neh-deh deqîqeyan de ser wan tije kinc kirin. Şêrgeleyan jî piştî ku di cih de kincên xwe guhertin, derbasî odeya mêhvanan bûn û bi kêf kişiyan ser xwarinê. Xawrin hêrûn, dims, penêr û mast bû. Çayê jî hebû. Lê hîn qedeh neanîbûn.
Dûpişk ketibû tayê. Xwe bi ser hev de dihesirand û
20
xwarin dixwar. Bi wî haweyî piştî ku çend gep xwarin, xwe ji ser sifreyê vekişand, nosîcan neda û pala xwe da zemberîşan. Bi zemberîşên di ber diwêr re çep û rast jî zemberîş hatibûn danîn. Ji zilaman rê û rêwanî di hindur de nemabû. Ji devê deriyê odeyê mîna zerzûlên ku bi refan li ser daran dilûsiyan, xuyanî dikirn. Digel ku li gora emirê partiyê divabû li himberî şêrgeleyan bêdeng rawestiyana, lê ji her hêlê ve xirecir û pistepista mêrikan bû. Wek guran li keft û lepta şêrgeleyan dinerîn, lêvên xwe dicûtin û ha ha çixare dikişandin. Ji kuşekuşa devê wan û kêşa ku bi çixareyan xistibûn, dixanê li her derê odeyê dilîst.
Rewşa Dûpişk xerab bû û civatê jî berê xwe bi wî vekiribû. Dûpişk hîç nedixwest bipeyivya û her kesî jî mîna ku dixwest ew bipeyivya ji vir û wir gotin diteriqandin û ew li

xeberdanê sîr dikirin. Di dawiyê de Dûpişk xwe negirt, bi haweyê ku li mala Dimdim rûniştibû, rûnişt û bi hêrs piştî ku got ”dengê xwe qut bikin!” û ji her kesî deng qut bû, wî dest bi gotinên xwe ên her tim kirin:
”Xelkê kohî tune bû, Serok Altaxus ew çêkir. Kohî tirsonek bûn, Serok Altaxus cesaret da wan. Em hemû bi xêra Serok hene. Ev nanê ku em dixwin bi keda wî ye”, got û ji nişkê ve devê wî xiliqî. Di cihê xwe de zîz bû û veziliya. Civat behetî. Weş li civatê ket û her kes ji hindama xwe ve ber pê de beziya.

21

Şêrgeleyên ku ji Dûpişk aciz bûn, Dûpişkê ji qiramketî li gund hiştin û li derdora nîvroyê bi kêf û eşq ji gund dan rê. Di nav wan de ê herî bi kêf Çolo bû. Mêrik dabû pêşiya hemiyan û mîna ku berê wî li hewarê bû bi lez û bez diçû. Bi zixurên ku ji ber lingên wî dipekiyan û mîna derbên qewsikan vizînî bi derûdorê dixistin, teyrik û tilûr bê serî ji hêlînan difiriyan. Hîn nîv seetekê rê neçûbûn, bi qasî sêçar latan li hevalê xwe ferq kiribû. Heger her ji bêhnikekê Dimdim gazî wî nekiribaya û ew jî hinekî ranewestaya, ji sedî sed wê ji ber çavên wan winda bûbaya. Mêrik nameya ku Serok Altaxus jê re şandibû wek niviştekê, bi naylonê pêçabû û li ser dilê xwe girêdabû. Û her ji bêhnikekê jî destê xwe bi hêdîka li ser digerand. Îcar gava ku destê wî digiha niviştê jî, çelq lê diket û mîna pêlên behran di ser hev re diqulipî û diçû. Ne kemînên eskeran, ne rêbir û ne jî serme dihat bîra wî. Hevalên xwe ji bîra kiribûn, xwe bi xwe dipeyivî û digot:

”Gelo ez ê li himberî wî insanê herî mezin bikaribim
xwe li ser lingan bigirim û bipeyivim? Gelo ew jî mîna me
hemiyan insan e? Ez bawer nakim. Ew ne dinyayî ye.
Xwedê ew di rengê insên de rêyî dinyayê kiriye…“
Di dawiyê de Dimdim jê tam hêrs bû, fîşek ajot devê
sîlehê xwe û bi dengekî berz gotina xwe a dawî jê re got:
”Heger tu li bendî me nesekinî û em bi hev re neçin, bi
telaqên Serok Altaxus dikim ez ê li ser te deynim!”
Ev sûnda wî a herî mezin bû. Sûnda wî sûnd bû û Çolo
jî baş pê dizanîbû ku Dimdim xwediyê sûnda xwe ye. Dimdim
hetanî ku kêr negihaba hestî ev sûnd nedixwar. Bi
22
tirba kalikê xwe sûnd dixwar. Di vê dawiyê de bi şikeftên
Morînê jî sûnd dixwar. Eskeran li derdora Morînê lê teng
kiribûn, di şikeftekê de xwe veşartibû û xelas bûbû. Şikeft
wek cihê welî û enbiyan didît.
Çolo piştî ku bi sûnda Dimdim re mîna tayikekî rût di
cihê xwe de sekinî û li paş xwe nerî, Dimdim destê xwe lê
hejand:
“Kuro min digot qey li vê dinyayê kesek ji min
ehmeqtir tune bû, lê xuya ye ku tu ji min bi gelekî jî
ehmeqtir î. Bêhna xwe fireh bike, tu ê bigihê ser helawa
miriyan…”
Hewrên baranê dapiçiyabûn. Li hin cihan sahî bû. Mij
û moran di newalan de civiyabû û hêdî bi hêdî ber bi
ezmên de bilind dibû. Ji dengê teyrik û tilûran bêhtir dengê
ava ku ji qelş û rizdên zinaran diherikî dihat. Bayê şevê bi
qasî ku dar û deviyan nehejîne şikestibû. Lê belê di sirta

çiyê de cih bi cih bê hinekî dixurbiland.
Herpênc şêrgele jî bi ser xwe ve hatibûn. Navê betilandinê bê çi bû li dor yekî ji wan jî nemabû. Hemû girs, bi hêl û mêl û bi ser de jî berê wan li Keleha Mezlûman bû.
Li wir Serok Altaxus bêsebir li bendî wan sekinîbû. Heger dawiya dinyayê jî hatibaya, dîsa jî divabû bi tiştekî daneketibana û di çend rojekî de xwe gihandibana Serok Altaxus.
Wilo ji hev re gotibûn û niha jî hemû hatibûn ser derba xwe. Ma êdî rê xwe li ber wan digirt!
Dimdim ket serî, Çolo da dû û ên din jî yek bi dû yekî de rêz girtin û kaş û berkaş bûn. Kişiyan û vekişiyan û mîna dozerê çiya dan ber xwe û bi newalan de çûn xwarê.
23
Ji aş û baş de peyivîn û bi ser hev de hilnebûn. Ji gotinên şewat reviyan, pêkenîn ji pêkenînê vêxistin û keniyan. Bi devjengên li ser mijarên ku ne karê yekî ji wan jî bû rahiştin hev, lê neketin qirika hev. Her ê ku peyivî, ên din bi hev re lê guhdarî kir. Ji her kesî bêhtir Remoyê mezrî dipeyivî. Mêrik bi çavên aliman li xwe dinerî û mijarên ku wî diavêtin holê hemû jî çîrokên li ser gur û rovî û hirçan bûn. Dimdim hindikî dipeyivî û Çolo jî hema hema nedipeyivî.
Heger Dimdim carcarê dengê xwe lê nekiribaya û jê re ne gotibaya ”Çolooo, ma keska seyidan bi min ve ye ku tu di bin qûna min de dimeşî, hinekî xwe dûrî min bike“ û wî jî negota “li qisûra min nenere“, belkî heyvanê deng jî jê derneketibaya. Çoloyê ku hişê wî ji Serok Altaxus pê ve ne li dereke din bû, gava ku destê xwe datanî ser nivişta xwe, wek babîsokê diçû. Û ew yeka han jî dibû sebebê

ku Dimdim her tim pê re bixeyidya.
Şêrgeleyên ku bi meşa hespên rehwankî diçûn û bêhnvedan nedan, bi esirkî re çiyayên Omerê derbas kirin û dan çolbirên qelaçên gundên Nisbanê. Li vir Dimdim hîn bêhtir li xwe xist, xwe da berpalên qelaçan û bi lez û bezê berpal û berpal hetanî ku gihan Dêra Çomarê meşiyan. Dema ku gihan nav xiramên dêrê, li wan bûbû esira teng. Qonaxa wan gundê Kertmînê bû û gund jî li ser keviya mayinan bû. Ji vî gundî wê xwe berdana binya têlê û ji reşayê re jî hîn tibabek mabû ku têketa erdê. Ji Dêra Çomarê hetanî bi Kertmînê seetek rê bû, lê bi meşa wan qey bîst deqîqeyek dikişand yan nedikişand.
Şêrgeleyên ku divabû li xwe kiribana reş û xwe berdana
24
gund, li ber şikêreke kufarî komikî rûniştin. Lê çawa ku rûniştin bêyî ku tiştekî ji hev re bibêjin, bi haweyê ku qebheteke mezin kiribûn, wilo jî ji hev belav bûn û çavên xwe li latên mezin gerandin. Ji bilî Dimdim herçar şêrgeleyan jî di taldeya lat û berqefan de çong berdan erdê û xwe li ser piştê pal dan. Dimdim jî piştî ku got “binere hûn di xew re nerin, ha!“ ji taldeya dara ku bi qurmê wê de dimîzt derket, çend gavekî meşiya û sekinî. Dû re jî destên xwe xistin kêlekên xwe û çavên xwe li derdorê gerandin. Derdor xalî bû. Li roava nerî, ro ketibû tasê û hêdî bi hêdî newal reş dibûn. Peşkên baranê jî dihatin. Sura bê hebû, lê dîsa jî dinya ne sar bû. Dimdimê ku ji xwe bêhtir li hevalên xwe difikirî û hevalên wî jî bi çar guhan lê guhdarî dikirin, vê carê jî tilîkên xwe di erdê de rakirin. Erdê têra xwe av vexwaribû.

”Eman eman, rextan li newqa xwe sist nekin! Qayişan jî. Xwe bi dest erdê ve bernedin, erd wê we bimije û hûn ê keslan bikevin“, got û di stara ferşekî mezin î şehkirî de çarmêrkî rûnişt. Lêbelê çawa ku rûnişt wilo jî li tûrikê xwe ê mewîjan xebitî û bi çengan mewîj avêtin devê xwe. Hemiyan jî westiyayî xuyanî dikirin. Bi rê de ji bilî ku du carekî ji hewd û hewdikan avê vexwin û bimîzin, kesek nesekinîbû. Çixare jî nekêşandibûn. Çixarekêşê wan bi tenê Remo bû û wî jî kêm dikişand. Ne lingên yekî ji wan li kevirekî terpilîbû û ne jî dereke kesî li şaxê dar û deviyekê aliqîbû. Bi gotinên xweş, dilê geş, pêkenîn û devjengan rêwitiyeke bêwestan kiribûn.

Ji ser çiyayê Çomarê gund û bajarên Bintêlê mîna kefa

destan xuyanî dikirin û Çolo jî rabûkirî li wan dinerî. Mêrik temamê hinera mejiyê xwe berdabû ser qudreta Serok Altaxus, diruvê wî bi her tiştî xistibû û li gora keft û lepta tiştan dixurcilî. Ev rewşa wî ji hew bêhtir bala Dimdim kişandibû. Dimdim dev ji xwarina mewîjan qeriyabû û hema lê dinerî. Di eslê xwe de asas a ku bala wî kişandibû û ew ecêbmayî hiştibû, livandina Çolo a li ber şewqa terempêlan bû. Terempêlên ku yek bi dû yekê de di ser Rêya Talanê re ber bi Mezra Botê ve dikişiyan, gava ku Nisbanê derbas dikirin, li hindama Kertmînê didan kêş û ji nişkê ve derdiketin, şewqa çavên wan bi şewqa elektrîkên Kertmînê re dibûn yek û di ezmên de çirûsk vedidan. Aha Çolo jî bi vê şewqê û van çirûskan re mîna zirnazîqê habela dadihat û hildihat û zîq û qîq li erd û ezmên dinerî.

Reşayî ketibû erdê. Paldana di taldeya lat û berqefên
kufarî de, bi şêrgeleyên ku rêya şeş-heft seetên êzingvanekî
têrî diajot û ew jî di çend seetekî de meşiyabûn, xweş hatibû.
Çolo di meqamê Serok Altaxus de di silûkê de bû û
Dimdim jî xwe ji bîra kiribû. Heger Çolo bi dengekî melûl
negotiba:
”Hevalino, gelo mirov li ser çarlepikan yan li ser qerevîzkan
û yan jî gelo bi qûnkişkê diçe hizûra Serok Altaxus?“
dibû ku di wê şevê de bintêl nebana û Serok Altaxus jî li
wan hatibaya xezebê.
Şêrgeleyên ku bi dengê Çolo re şiyar bûn ”wey wey wey,
kuro li me bû dereng!“gotin û her yek ji hindama xwe de
mîna pisîkê çengî wê navê bû. Lêbelê Çolo li wê helepela
hevalên xwe hayî nebû û ew pirsa xwe a berî niha dubare
26
kir. Dimdim xwe jê aciz kir û bi qîjewîj bersiv dayê:
”Zû xwe bide ser hev ku dibêje ma mirov li ser çarlepikan
diçe ba Serok Altaxus. Ma em kûçik in ku em li ser
çarlepikan herin? Serok Altaxus jî mîna min û te insan e.
Helbet tu ê li ser lingan biçî ba û derkevî hizûra wî.“
Dû re jî bi haweyê ku poşmaniya xwe bîne, di ber xwe
de got, ”ya Rebî tu çêkî!“ û bê serî xwe ji sirtê berda newalê.
Ên din jî hema dan dû. Lêbelê Çoloyê ku li ezmên dinerî
hîn jî ji cihê xwe neqeliqîbû û bi ser de jî keysa xwe li
devjengê xweş kiribû:
“Hevalê Dimdim, dibe ku Serok Altaxus mîna me insan
be, lê mirov nikare tarîfa wî bike, ma ne ji xwe? Mirov
dikare wî bibîne lê gelo wê mirov karibe ji ezameta qudreta

cenabê wî fêhm bike?...”
Ew hîn wilo di wê mihasebeya cenaban de bû û Dimdim jî ji binê newalê guleyek di ser re firand. Dû re jî heta ku jê hat dengê xwe rakir û bi zirtan ew da ber hev. Çolo bi teqîna fîşekê re bi xwe hisiyabû ku dîsa Dimdim ji xwe aciz kiriye û di vê carê de jî heger bi haweyekî ber dilê wî negirta, Dimdim wê çiqek tê de kiribaya. Wilo difikirî û bi wê tirse bi bazdan xwe ji kêş berda.
”Hevalino ez di bextê jina we de min bi tenê nehêlin û neçin!“
Yek ji hevalên wî ên ku di binê newalê de li hêviya wî sekinîbûn ji gotina wî a ”bextê jinê“ engirî û di ber xwe de gotineke pîs pê re kir. Deng çû Remo, lê Remo tişt li xwe çênekir. Dimdim çeqmaq ji bêrîka xwe derxist ku işaretê bide Çolo. Kir ku çeqmêq pêxe, pênexist û gazî kirê:
27
”Were nihîtê neqeban, were! Ma kî ji me dikare mala xwe xerab bike dev ji te berde û here!“
Dimdim hîn wilo gazinokî dipeyivî û reşê Çolo ji wan xuyanî kir.
Dîsa bûn ristik.
Dimdim bêyî ku bi kesekî re bipeyive, ên din jî nepeyivin, ket serê rêzê, Çolo da dû wî û hemiyan bi hev re gav li ser gavê radan. Hîn bi qasî mişarekî neçûbûn, ji nişkê ve Çolo terpilî. Mêrik neket lê Zinarê ku bi dû wî de bû, devdevkî kişiya erdê. Heger ev xortê bekirî, hema berî bêhnekê bi vî rengê niha ketibûya, miheqeq wê dev û ruyê wî pelixîbaya. Ji bestê dageriyabûn nav erdê beyar û xwediyê

erdê damankirî jî sala çûyî erd ji keviran safî kiribû. Bi tenê hew kefa destê wî ê rastê selixîbû.
Kûçikên gund zû bêhna şêrgeleyan kirin; reyan û ber bi wan de beziyan. Lê piştî ku nêzîkayî li hev kirin û dengê Dimdim nas kirin, hemiyan jî bi haweyê ku izra xwe jê bixwazin, teriya xwe bi nav şeqên xwe de berdan û bê deng li gund vegeriyan.
Kertmînê avî, şênî û baş jî mezin bû. Bi şev li ber ronahiya elektrîka dîrekên wê ên bilind, li ser bênderên jora gund, mirov xweş dikarîbû bi gokê lîstiba. Belkî xortên gund dilîstin jî. Qereqola wê tam diket nava gund. Hejmara eskerên wê di navbera şêst û heftêyî de bûn. Çolo berê jî çend carekî hatibû vî gundî. Lê xortê bekirî û zozanî cara pêşî bû ku dihatin. Gund bi belediye bû û reyisê belediya wê jî ji tirsa bûbû alîgirê partiya şêrgeleyan. Mêrik dewlemendekî mezin bû. Ne axa bû, lê xwedî erd bû. Kertmînê
28
hema hema bi Nisbanê ve bû. Ji gund bi meşê hetanî nav bajêr, qey nîvseetekê rê dikişand. Rêya Talanê diket jêra gund û xeta mayinan jî hema di binya rê re bû.
Mala ku şêrgele lê bûn mêhvan nemerdî ne xistin tiştekî. Mal ji aliyê rohilat ve hinekî ber bi qorziya gund de bû. Xwediyê malê mîna ku çavdêrî li rêya wan kiribû, çawa ku Dimdim li deriyê hewşê xist, bêmefer derî vekirin û hemû rast derbasî hindurê malê kirin. Xanî piçûk bû. Xanî ji du odeyên bi ser hev ve û salonekê pêk dihat. Mirov di salonê re derbasî herdu odeyan dibû. Ji dan û stendina Dimdim a bi kebaniya malê re vekirî xuya dikir ku ew gelek

caran hatibû vê malê. Kebaniyê jê re digot ”lawê min“ û wî jî jê re digot ”dêya min.“ Hîn şêrgeleyan newqa xwe ji rext û fîşekan venekiribûn, dê û lêw bi hev re kerxek xwarin kişandin salonê û gotin ”kerem bikin ser xwarinê“. Şêrgeleyan jî hema wilo, ne dengê xwe kirin û ne jî solên xwe ji lingên xwe derxistin û teqeze kişiyan ser sifreyê.
Xwediyê malê jin û mêrek bûn û herdu jî baş pîr bûbûn. Bi tenê lawekî wan çêbûbû û ji wî lawî jî keçek û du law veketibûn. Bav bi herdu lawên xwe ve, bûbûn şêrgele û hersê jî di hindurê çend mehekî de yek bi dû yekî de hatibû kujtin. Termê wan jî winda çûbûn. Sûretê wan û Serok Altaxus digel hev ve bi dîwêr ve daliqandîbû. Serok Altaxus di nava wan de sekinîbû, destê xwe danîbû ser milê wan û hinekî jî mîna ku dibişirand, lêvên wî ji ser hev çûbûn.
Pîrê û kalo piştî ku mêhvan bi şîv kirin, herdu jî derketin nobetê. Pîrê li ser neqeba xênî di neqeba herî jorê de
29
rûnişt û kalo jî li derveyî hewşê çû û hat. Pîra ku ji çîmên xwe hinekî bawî bûbû, hişk bi çeperên derenceyê girtibûn. Lerza canê wê, bi lerza çeperan ji dûr ve xuya dikir.
Şêrgeleyan şîva xwe zû xwarin. Lê Dimdim ji hemiyan jî zûtir xwar, bi qasî deh-pazdeh deqîqeyekî xwe ji wan vedizî û bi çewalek sarox, bimbe, du rext û sê keleşkofan bi ser wan de hat. Rextek û keleşkofek da dest Çolo, ”zû xwe girêbide“ got û sarox li arpiciyên xwe rast kirin. Dû re çefiya xwe li stuyê xwe gerand û toqeke darînî derbasî stuyê xwe kir. Dû re ji çewalê ku bi zincîran dihat girtin û vedibû

bombe derxistin, ji bilî Çolo, her hevalekî xwe du
bombe dan wan û ên mayî tev li saroxan, wek qûşekê li
newqa xwe rast kir. Dû re jî rextê keleşkofê da newqa xwe
û du keleşkof wek du demaçeyan di kêlekên xwe de danîn.
Çolo ji xortê zozanî bêhtir ecêbmayî lê dinerî û di ber xwe
de ha ha digot ”haho haho, ev çawa insan e! Gelo li temamê
dinyayê insanekî mîna vî wilo mêrxas heye?“
Dimdim piştî ku her hevalekî xwe kîsikekî vala xist
destê wan û got ”têxin bêrîka xwe, dikare lazim bibin“, gazî
pîrê û kalo kir.
Pîrê berî kalo derbasî hindur bû, lê herdu jî zû hatin.
”Ez bi telaqên Serok Altaxus dikim ku em ê eskerên
hidûd ji hevdu tar û mar bikin! Zû xwe bidin ser hev da
em û wan qûncilikan di hev re bifirin!“
Şêrgeleyên ku ji zû de li bendî vê peyvê bûn, yekser xwe
dan ser hev ”em hazir in“, gotin û di cihê xwe de çik sekinîn.
Kêfa Dimdim bi vê lepta wan a sivik hat. Berê xwe da
30
pîrê, herdu destên xwe ên ferşînî ber bi hevalên xwe de
vekirin û çepilên xwe hejandin:
”Dayê, de ji xwe re li hevalên min binere, tu dibînî bê
çi wek deq in; hevalên min ji min jî jêhatîtir in, ha!“ Dû
re jî, “hevalino, xatirê xwe bixwazin”, got û di devê derî de
li bendî xatirxwestina wan sekinî.
Şêrgeleyan xwest ku biçin destê pîrê û kalo, lê pîrê û
kalo nehiştin. Pîrê mil û kalo jî serê wan maçî kir. Dû re
jî pîrê hinekî ji wan dûr sekinî û got:
”Lawên mino, qet ji bîra mekin ku barê welatekî li ser

milên we ye. Bila tu carî rehma qûncilikan nekeve dilê we.
Bav û kalên me bi derewan negotine ku ´berxê nêr ji kêrê
re ye´. Eferim beranên mino. De herin, destê Xwedê û
pêxember û temamê welî û enbiyayan li pişta we be!”
Bi gotinên pîrê re Dimdim, wek dimdimekî di cihê xwe
de hejiya, keliya, fûriya û xwe da deriyê hewşê.
Hevalên wî dan dû û bi bayê beza xwe re ji gund derketin.
Piştî ku hinekî ji gund bi dûr ketin û ji hêla rohilat
ve jî nêzîkayî li Rêya Talanê kirin, Dimdim digel hemiyan
rûnişt û ew şîret kirin:
”Baş baş li min guhdarî bikin! Her gotineke min bikin
guhar û bi guhên xwe vekin. Min çi got hûn wê bikin.
Wekî din tu rê ji kesekî ji me re tuneye. Çewtiya herî
piçûk, bi kujtina me herpêncan e, wilo bizanibin da hûn bi
gotinên min bikin. Temam?”
Piştî ku hemiyan gotin ”temam”, wî dest pê kir:
”Yek: Ji vir û pê ve êdî meşa rabûkirî qediya. Meş heta
ku em bintêl nebin, wê daqûlkirî, li ser çarlepikan, li ser
31
qerevîzkan, bi zikişkê, bi qûnkişkê û carina jî serpiştkî be.
Ev mercekî şerê hidûd e. Û mercê herî sereke ye.
Dudu: Ha ji wî aliyê rê”, bi destan pêş wan dikir, ”û
heta ku mirov digihê têlên mayinan, sê sed metreyek heye.
Îcar heta ku mirov xwe bigihîne têlan jî, mirov di nav
kemînên eskeran re diçe. Kemîn sêkuçî ne û hemû jî bi qasî
sê sed-çar sed metreyekî nêzîkî hev in. Eskeran tabiyên xwe
sed metreyekî ji rê û du sed metreyekî jî ji têlan dûr kolan
e. Erê hevalino, em xwe çawa bikin jî ew ê bi me bihisin.

Lê min jî her gavê berî ku ew bi me hisiyabin, ew bi me hisandine. Bi wî haweyî esker binsahwî mirov dibin. Wek ku Serok Altaxus jî dibêje, derba pêşî girîng e! Werhasil, girîng be ne girîng be, bi şerên eskeran re min fêdeya xwe ji derba pêşî dîtiye.

Sisê: Trên di nav erdê bintêliyan re diçe. Îcar ji têlan û heta ku digihê rayên trênê, çar sed-pênc sed metreyek rêya me ye û rê jî hemû bi mayin in. Ji bo me a herî zor ku em çeperên eskeran derbas bikin. Nav mayinan xelasiye ji ber ku ez ê mayinan rakim û esker jî wê neyên nav mayinan. Derbaskirina ji çeperan jî rihet e, lê ku mirov xwe netirsîne rihet e. Aha tam di wan kêlîkan de, tirs mirin e û mêranî jî jîn e. Esker reng û dengê min û sîlehên min baş nas dikin. Newêrin xwe bidin ser me; serê xwe dixin erdê û korfelaqî fîşekan berdidin. Lê dîsa jî çavên we li tabiyên wan bin da hûn bizanibin fîşek çawa tên.

Çar: Ji ber ku em ê di şivîlekên nav mayinan re neçin, ez ê mayinan rakim û em ê pê bi pê biçin, hûn divê dûrî min bisekinin. Ez ê ben bi newqa yekî ji we ve girê bidim

32

û çi gava min ben kişand, beyî ku hûn ben sist bikin rast xwe li min bigirin. Binerin, esker çiqasî li we bireşînin jî hûn cihê xwe neguhêzin. Her der bi mayin in. Li vê herêmê digel ku bi sedan mayin bi qaçaxçiyan û hevalan de teqiyane û min jî bi sedan rakirine, hîn jî ewqas hene.

Pênc: Heger ez hatim kujtin û hûn jî di nav mayinan de bin bi paş de vegerin. Hûn ê nikaribin ji mayinan xelas bibin. Û xala şeşan jî min bi rê de gelek caran ji we re gotibû,

lê ez ê dîsa bibêjim. Birîndar li erdê namîne. Lê heger
ku ez birîndar bûm û min ji we re got dev ji min berdin,
hûn ê dev ji min berdin û herin. Ewqas. Temam?“
”Temam.“
Pirseke ku hûn ji min bikin heye?“
”Na.“
Sîpan tu bide dû min, bila Zinaro bide dû te, Remo
bide dû Zinaro û Çolo tu jî li dawiyê be. Wilo?”
”Wilo.”
”Guhên xwe bifirkînin!“
Firkandin.
”Destên xwe bidin bombeyan!“
Destên xwe dan wan.
”Fîşekê biajon devê sîlehan!”
Fîşek ajotin devê sîlehan.
Dimdim rabû ser xwe. Piştî ku li derdorê baş nerî û
pêjina eskeran nekir, ”ez çawa meşiyam hûn jî wilo bimeşin”,
got û li ser çarlepikan ber bi rêya Talanê de çû. Zû
gihan qiraxa rê. Lêbelê hevalên wî li vir pê re dernexistin
serî. Gava ku wî bi hilm û pifekê re xwe avêt wî aliyê rê, ji
33
nişkê ve şewqa terempêlekê da ser van ên din. Ji bêgavî wan
jî hema xwe bi erdê re kirin yek û devê sîlehên xwe ber bi
şewqê de vekirin. Cîbeke sivîl bû. Pir xurt diçû. Di dawiyê
de wan jî xwe gihand wî aliyê rê. Bi wî haweyê ku kirin
kêfa Dimdim hat. Piştî ku bi dizîka eferimek da wan, berê
xwe ber bi eskeran de vekir û got:
”Ez ê çend mişarekî ber bi milê çepê de herim; li wir li

eskeran biteqînim û li we vegerim. Îcar gava bû teqîn, xwe ji vir nedin alî û cihê teqînan nas bikin.“
Wek mêr çû, lê wek volkanekî jî teqiya! Pêşî qêriya û nav di xwe da:
”Ez şevgerê şevê û gurê eskerên romê me! Ez nihîtê kozik û çepera Hemê Gozê me! Ez xincera destê Eliyê Betê me!...“
Bi dengê teq û req û qîrên wî ên ku mîna birûskên biharê li derdora gundê Kertmînê vedidan, çarhawêr qiyamet rabû! Mirov digot qey ji Mezrê heta ku digiha Nisbanê, binê erdê bi sîleh û cebilxaneyan rapêçayîbû. Bi hezaran fîşek teqiyan. Herder dihejiya. Şev wek teniya binê beroşê reş bû û her der di nava ronahiyê de mabû. Ji her derê agir dipijiqî. Gule bi ezmên de mîna stêrikan dirijiyan. Saroxên ku wek sersotên êgir bêwestan bi vir de û wir de difiriyan, her der sincirandibûn.
Dimdim piştî ku derba xwe di eskeran de werkir û têra xwe jî qêriya, hilmekê bêdeng sekinî û ji nişkê ve saroxek di tabiya ku hema di binya hevalên wî re bû werkir. Bi saroxa wî re yekser deng ji tabiyê biliya. Lê hilmek-dudu neketin wê navê, wek ku mirov xwê biavêje nav êgir, ji
34
tabiyê fîşek rast bi ezmên de firiyan. Niha êdî Dimdim bi ser ketibû. Eskeran bi teqîna di wî rengî de rêya ku bintêl bûba jê re vekiribûn. Lêbelê wî ji wê jî bêhtir ji wan xwestibû, bi herdu keleşkofên xwe ên ku wek du demaçeyan bi dest xwe ve girtibûn, li tabiyê girêdabû û hêdî bi hêdî ber pê de dimeşiya. Di dawiyê de herçar eskerên ku di tabiyê

de bûn dev ji teqînê jî berdan. Lê Dimdim domand. Esker qêriyan:
”Yaho teslim teslim! Birak bizi, geç geç! Rome abe, Hemo Goze abe, Ali Bate abe geçin geçin!...“
Dimdim jî ji hêlekê ve gazî hevalên xwe dikir ku rast xwe lê bigrin û bên ba wî û ji hêlekê ve jî libo libo fîşek di ser tabiyê re difirandin.
Şêrgeleyên ku bi hemû haweyî li gora şîretên Dimdim tevdigeriyan, bi hilm û pifekê re xwe gîhandin cem. Kêfa Dimdim tiştekî zêde bi wê cansivikiya wan re hat. Dimdimê ku bi vî rengê niha gelek caran şêrgele bintêl û sertêl kiribûn û di nav wan de jî qet li grûbeke bi qasî grûba vê carê jîr û jêhatî rast nehatibû, ”Birawo ji we re! Bi telaqên Serok Altaxus hûn ji min jî jêhatîtir in“, got û çavên xwe li derdorê gerandin. Saxtîkirina wî a bi çavan, hemû çend saniye derbas nekiribûn, destê xwe hêdî bi hêdî ber bi jêrê ve rada:
”Me tabî derbas kirine. Lê tabiyeke ku divê pêşî em hemû bi hev re berdênê aha di tenişt me de ye“, eskeran ji wê tabiyê ha ha bi erdê ve direşandin,”piştî ku me bi hev re destekî teqand, bêdeng û bi zikişkê herin heta ku hûn bigihên têlên mayinan û li wir li bendî min bisekinin.
35
Mereqan nekin ez ê xwe bigihînim we“, got û hemiyan bi hev re li tabiyê reşandin.
Dimdim biçûna hevalên xwe re şer tam li ser xwe giran kir. Ji tabiya ku lê girêdabûn berê fîşekan ber bi ezmên de vekiribûn, lê ji tabiyên din bi sedan gule di ser re difiriyan.

Dimdim hatibû xapandin. Bi taktîkên ku her tim li himberî
eskerên hidûd bi kar anîbûn şer dikir û di gelek tabiyan
de jî bi eskeran re tîmên ku li herêmê insan digurandin
bi cih bûbûn. Dimdim bi wê yeka han ne hisiyabû. Komutanê
tugaya Mêrdanê berî mehekê bi wî planî rabûbû.
Dimdim bi wan re şerekî qut î girover li dar xistibû, lê
wan jî hîç eman nedidanê. Mirov digot qey du ordiyan bi
hev re şer dikir. Di vî şerî de ji dengê tenq û top û balafiran
pê ve, hema hema dengê hemû sîlehên ku di destên
tugaya Mêrdanê de bûn dihat. Û di destên Dimdim de jî
du keleşkof, du demaçe, du arpicî, heft bombe, şazdeh
sarox, kêreke mayînî, xincereke soranî, du şîşikên kebabê û
tûrek fîşek hebûn. Dimdim hemû bi kar dianîn, lê çi fêde.
Eskerên ku ew bi qasî tabûrekê bi hêz didîtin, sahwa xwe
jê revandibûn û tam lê teng kiribûn. Di her saniyê de dikarîbû
bihata kujtin. Û heger dev ji him û gima arpiciyên xwe
bernedabaya jî wê bihata kujtin. Saroxên wî malê erebî
bûn. Pir deng didan û pir jî şewq vedidan. Partiyê sarox ji
ordiya Seddêm bi dest xistibûn. Saroxên ku bûbûn mixbirçiyên
wî, rêya şer û revê jê re nehiştibûn. Sarox wek gilokên
êgir diçûn. Tîman cihê wî keşif kiribûn û bi rêya bêtêlan
berê eskeran bi hindama agirê wî de vekiribûn.
Dimdim di rewşeke pir xerab de xwe gihand hevalên
36
xwe. Lêbelê çawa ku giha wan wilo jî mîna dêwekî heftserî
ji hindam de ket û bi gij û xij û kufîniya gayekî re di nav
pûş û pelaxa qirêja zemanên zilmê de veziliya. Bi xwevezilandina
wî re reşika çavên hevalên wî jî kûr çûn û di reşaya

şevê de li hev qulipîn. Çavan êdî ne dûr û ne jî nêzîk ji hev fesilandin. Mejî çerx nekir û êqil jî nenisiland. Ji kelaxê wan ên ku di rengê deviyên qelaçan de xuyanî dikir, xof difûriya. Erê, aha wan ên ku çend bêhnik berê xwe wek şêran didîtin û niha jî bi çavên kêzikan li xwe dinerîn, ji xelasiya canê xwe pê ve li tiştekî din nedifikirîn. Mêrxasiya di tesîra mêrxasan de tiştekî çiqasî talûke bû, çiqasî kufikî, xapînokî û zalim bû, Dimdim êdî niha baş fêhm kiribû. Lê behetandina yekî ji wan jî ne bi qasî a Çolo bû. Çoloyê ku kela girî ketibû qirikê, xwe avêtibû ser cendekê wî û bi herdu destan li birînên di canê wî de digeriya, xistibû serê xwe ku heger tiştek bi ”qehremanê wî ê qehremanan“ hatibaya, hema li wê derê wî jî wê xwe kujtibaya. Dimdim bi şerê ku kiribû di çavên wî de ji Restemê Zalê jî mezintir bûbû. Li gora wî mirovên di tayê wî de li dinyayê tunebûn û ew mirov jî di nav destên wî de mîna rêsiyekî li hev geriyabû. Çolo ew baweriya xwe a ji dil û kezebê, bi xwîna xwe a ku sênga xwe terişandibû û ha ha di eniya wî de dida, peyitandibû.

Dimdim bi wê vezilandina xwe a kerixî dizanîbû ku bêmoralî çêdibû û bi ser de jî ew bêmoraliyeke wilo bû ku dikarîbû dawî li jiyana hemiyan bianiya. Lê rewa tê nemabû. Ziwa bûbû. Zimanê wî kişiyabû. Ewqas jê hatibû. Di wê bêhnikê de cerekî avê jî têhna wî nedişkenand. Ji xwêh-

37

danê şil û pil bûbû. Xwêhdanê di cilên wî re avêtibû. Her derê wî di nav heriyê de mabû.

Dimdim piştî ku tibabê çixareyekê li erdê bêhis û pis

vezilyayî ma, li qûn rûnişt û sivik peyivî:
”Tiştek bi min nehatiye, xwe ji ser min bidin alî. Canê min qerimî bû ewqas.”
Bi dengê wî re şêrgele hema vebûn û dîsa bûn ew mêrxasên berê. Di wê navê re jî çar panzêrên ku ji hêla Nisbanê ve hatibûn, li ser rêya Talanê sekinîbûn û ji wir şintaq diavêtin nav mayinan. Terempêlên eskerî pir bûn. Du helîkopterên skoskî li ser tabiyan dilîstin û yekê jî xwe danîbû.
Lêbelê piştî ku helîkoptera din jî firiya û rast berê xwe da Mêrdanê, herduyên din ber bi mayinan de sûrikîn û hema di cih de jî ber bi tabûra Qantirê ve dageriyan. Fîşek hîn jî diteqiyan, lê libo libo diteqiyan. Ew jî êretî.
Dimdim di kar û barên xwe ên nav mayinan de û bi taybetî jî di rakirinan mayinan de pir destsivik bû. Ji cihê ku lê rûniştibû bi lez meqesek ji kêleka xwe a çepê kişand û bi meqes kişiya ser têlan. Têl zû qut kirin, rê vekir û hevalên xwe yeko yeko derbasî wî aliyê têlan kirin. Dû re gilokek qinab ji bêrîka xwe derxist, qinab bi newqa Çolo ve girêda ”yek bi dû yekî de bi dû Çolo de werin”, got û li ser qerevîzkan bi nav mayinan de meşiya.
Êdî niha dor hatibû rakirina mayinan û di rakirina mayinan de jî serîyekî rihet û bêhnfirehiyeke mezin pêwîst bû. Li gora Dimdim ew yeka han aliyekî meselê î cidî bû. Lê asas a herî cidî ew bû ku esker tu carî li mayinder hayî nebana. Mêrik him wilo digot û him jî her ku bi şêrgeley-
38
an sertêl û bintêl dibû esker bi xwe dihisandin û dida nav mayinan. Dimdim di rewşeke wilo xerab de bû ku divabû

ji rakirina mayinan pê ve li tiştekî din ne fikirîbaya û cimcimê
serê wî jî ji fikaran tije bûbû. Qedera herçar hevalên
wî bi herdu şîşikên wî ên kebabê ku bi wan mayin keşif
dikirin hatibû girêdan. Çewtiya wî a herî piçûk dibû sebeba
ku mayin biteqiya û canê wan bi perçeyên mayinên
”dewarî” re ji hev belawela bûbaya.
Tirsa nav mayinan tirseke din bû. Her çi tiştên ku li ser
ruyê erdê bûn mîna mayinan diketin çavên mirov. Her çi
tiştê ku dilebitî mirov bi teqîna mayinê ve girêdida; temamê
canê xwe bi ser hev de diguvaşt û xwe bi erdê re dikir
yek. Nav mayinan mîna goristaneke servekirî bû. Cihekî bê
hestî û qoqê serê insên û heywên tune bû. Mirov pê li
hestiyan dikir, xwe di ser qoqê seriyan re diqevast û diçû.
Dimdim giran diçû û yuzbaşiyê tabûra Nisbanê jî dikarîbû
bi çil-pêncî eskerî û ewqas jî tîm, xwe berda Qamişê
û li binya xeta trênê têketa pêşiya wî. Ji sala ku mayin hatibûn
danîn û heta ku şêrgeleyan dest bi şer kiribûn, yuzbaşiyê
tabûrê gelek caran li himberî qaçaxçiyan wilo kiribû û
di dawiyê de jî gihabû armanca xwe. Ne bi tenê yuzbaşiyê
tabûra Nisbanê, yuzbaşiyan seranserî hidûd, çi cara ku xwestibûn
bi wê yekê rabûbûn. Di vî warî de ilmê Dimdim
fireh bû û wî bi xwe ev tişt hemû ji birêvebirên partiyê re
gotibûn.
Dimdim herdu çongên xwe bi hev re berdan erdê û
destê xwe dirêjî bêrîka qutikê xwe kir. Ji bêrîkê seet derxist.
Seet dehê şevê bû. Lê bûbû dereng û bi ser de jî di cihê ku
39
tê re bintêl dibûn, mayin êretî yek di ber yekê de hatibûn

danîn. Heger li vir jî mayin bi qasî du-sê gavekî bi navbir
û sêkûçî hatibana danîn, belkî ewqasî lê zor nebaya. Lêbelê
vir derdora bajarê Nisbanê bû û derdorên bajaran û
hema hema temamên gundên ku li ser keviya sînoran bûn,
mayin ketûber binax bûbûn. Ne mimkin bû mirov xelas
bûbaya. Keserek kişand. Niha êdî baş li xwe hayî bûbû ku
xeteyeke çawa mezin kiribû. Di cihê herî xerab re bintêl
dibûn. Li vî cihî bi sedan pez û dewar û bi dehan jî insan
bi mayinan perçe bûbûn û hîn jî her der bi mayin bûn.
Mêrik kar li ser xwe pir giran kiribû. Ji kûraya kezebê dîsa
keserek kişand. Bêhna wî derneket, yeke din kişand û vê
carê jî tam di ser xwe re li ezmên nerî. Ezman bi hewrên
reş û tarî dikeliya. Hewrên ku di ser Dêra Çomarê re ber
bi Mezra Botê de li hev diqulipîn û diçûn, ji avê barkirîbûn.
Li ser serê çiyayê Bakoyê baran dibariya. Lê asas hewrê
ku Dimdim xof jê digirt, ji hêla girê Kewkê ve bi lez û bez
dihat. Rewş pir xerab bû û heger baran jî bibariya pir zor
dibû ku bikarîbûya ji bin raba! Di hingama baranê de
mayin ranedibûn. Baranê kolan dimiçiqand û têkiliya ku bi
şîşê digiha dest, geh dibirî û geh jî bi şêleke sixte dest dixapand.
Ji bo ku Dimdim jî neketiba wê xefikê, divabû erd
mîna cokê biqelaşta û çûbaya. Û ew yeka han jî qet nedibû.
Mêrik li dor nîv seetekê bû ku derbasî binya têlê bûbû,
neh-deh gavekî çûbû û bi tenê hew pênc mayin rakiribûn.
Dîsa sekinî, li hevalên xwe nerî û keserek kişand. Îcar tam
di wê bêhnikê de jî tiştê ku divabû nebaya, bû. Çolo pişkiya.
Dimdim bi pişkandina wî re paşpaşkî çeng bû û bi

hêrs ji wan re got ”xwe li ser piştê dirêj bikin!” Hemiyan xwe dirêj kirin. Lê piştî ku Çolo dîsa ew pişkandina berî niha kir, Dimdimê ku li hewa li perçên goştê canê xwe dinerî, ji ken xeriqî. Dû re jî li qûn rûnişt û bi kêf got: ”Kuro Çolo te ez ji desthilanîn xistim. Dengê pişkandina te mîna dengê barûda mayinên hespan e. Heyran nepişke. Berî pişkandinê me bi xwe bihisîne.”

Dimdim bi pişkandina Çolo re bi xwe şiyar bû. Dev ji ken û pêkenînê berda û bi lez destên xwe li kêrê û şîşikên xwe ên kebabê pelikandin. Kêr mezin bû zû dît. Di eslê xwe de ev a wî ne kêr bû. Mêrik li ba hedadekî mêrdanî ji bo rakirina mayinan tiştekî wilo çêkiribû ku ne kêr, ne satore, ne şûr, ne qezetore, ne rim bû û di heman wextê de jî ev hemû bûn. Di çi de, çilo, çawa dixwest wilo bi kar dianî. Dimdim piştî ku herdu şîşik jî dîtin, dest û zendên xwe li mayinan vemalandin û mîna dozerê erd da ber xwe. Wî ji hivdeh saliya xwe de dest bi qaçaxê kiribû û li ber destê qaçaxçiyên bi nav û deng ên wek Hemê Hiskê, Çeçanê Rişwanî, Seîdê Xursî, Reşîtê Miqrî û Eshedê Keferzî mezin bûbû. Çend carekî jî digel Bihemedê Metikê bintêl û sertêl bûbû û di her carê de jî wan û eskeran li hev teqandibû. Li gora wî, di nav qaçaxçiyan de Bihemedê Metikê qaçaxçiyê herî mêrxas bû û bi wî mêrxasî re jî di şeveke ku pir ji a îşev dijwartir bû mayin rakiribûn. Eskeran li hindama Girê Kemalo li wan teng kiribûn. Bihemed û Dimdim wek a vê şevê bi devê tivingê li hidûd xistibûn, eskeran jî rê nedabû wan û qederê seetekê li ber hev pahn bûbûn. Di dawiyê de kom li ser wan giran bûbû û filtî filtî xwe avêti-

bûn nav erdên mayinkirî. Lê eskeran li wir jî dev ji wan bernedabûn û bêwestan li wan reşandibûn. Bihemedê Metikê ji çîmê xwe ê rastê û Dimdim jî ji zendê xwe ê çepê birîndar bûbû. Li şensê wan ku gule goşt û goşt çûbûn û li cihê ku derb xwaribûn mayinek jî ne mabû. Hemê Heskê, çardeh mirîdên Mala Şêx Ehmed, garankî li wir qelibandibûn û erd ji mayinan safî kiribû. Ji bilî sê kesên omarî, ên din hemû têrî bûn.

Dimdimê ku wek pîvokan mayin radikirin û bi vir de û wir de diavêtin, tibabekî baş xwe bi nav mayinan de berdabû. Her ji bêhnikekê qinaba xwe dikişand, Çolo xwe lê digirt û ên din jî yek bi dû yekî de xwe li Çolo digirt. Di wan bêhnikan de her tişt li ser gora dilê Dimdim diçû. Remoyê ku goştê bizinê zêde zêde xwaribû, li ber têlan zikêşî bûbû û çend carekî bi nav şeqên xwe de berdabû, bi ser xwe ve hatibû. Ên din wek guran tevdigeriyan û Çolo jî bi dû ku di ber xwe de carekê kuxuya bû, nema kuxuya. Nema pişkiya jî. Tirsa Dimdim ji baranê jî nemabû. Li ser çiyayên Omarê ezman belek belekî bû. Ji Dêra Çomarê û hema bi wir ve çend steyrik ketibûn ezmên. Hewrê ku ji hêla girê Kewkê ve dihat gihabû gundê Dodo û li wir ava xwe vala kiribû. Bêhna barûda ku li erd û ezmên vedabû, êdî tam belav bûbû û eskeran jî nema korfelaqî fîşek berdidan. Erê, rewş ewqasî baş bû û ji nişkê ve Dimdim mîna hespê ku çav li mêr bikeve cefilî. Çoloyê ku hema bi dû de bû jê bêhtir cefilî û xwe li ser piştê avêt erdê. Ên din jî xwe serpiştkî vezilandin. Dimdim jî piştî ku bi lez û bez bi paş

de vegeriya, bi bayê beza xwe re ji wan re got ”bidin dû
42
min” û ber bi têlan de vekişiyan.
Hevalên wî ên ku nizanîbûn bê Dimdim li çi digeriya bêmefer dan dû. Ew hîn wilo ber bi têlan de diçûn û ji nişkê ve du helîkopter ji tabûra Nisbanê bilind bûn û rast berê xwe dan wan. Bêhnek nekete wê navê, ji tabûra Qantirê jî helîkopterek rabû û xwe li van ên din girt.
”Ew kîsikên ku min dabûn we bikşînin xwe!” Dimdim got û di ber têlan re berê xwe da rohilat.
Tev li wî hemiyan kîsik kişandin newqa xwe. Kîsik mîna kitanê tenik û di rengê pûş û pelaxa nav mayinan de bûn. Bi kumik jî bûn. Bi wan kîsikan eskeran bi roj jî nikarîbûn ew ji erdê bifesilandana.
Helîkopteran li derdora wan lîstin û hawêrdor şintaq gerandin. Tu kes nedîtin. Dû re bi qasî ku bi erdê re bifirin nizim bûn û tam di ser wan re çûn û hatin. Bi şintaqa ku ji wan diçû nav mayinan bûbû wek nava rojê û van ên din jî ber têlan girtibûn û têl û têl bêdeng wek mêr bi zikişkê disûrikîn. Di van bêhnikan de rewşa wan ji xerabê jî xerabtir bûbû! Çarhawêrê wan zengilê mirinê lê dixist. Ji her derê bêhna mirinê difûriya. Her der di nav lapûşkên mirinê de dilerizî û kêferat dikir. Yuzbaşiyê tabûra Nisbanê bi 40-50 esker û tîmî ve jêra wan zeft kiribû û di kemînê de li bendî wan rûniştîbû. Li jora wan panzer û terempêlên eskerî çeper girtibûn û rêya Talanê sekinandibûn. Esker li eskerên ser hidûd zêde bûbûn û bi ser de jî eskerên ku di tabiyan de bûn derxistibûn ser ruyê erdê. Ji hindama Nisbanê

û heta ku Kertmînê derbas dikir, esker komik bi
komik hatibûn danîn.
43
Dimdimê ku di van kêlîkan de temamê jîr û zanahiya
salên qaçaxçitiya xwe bi kar dianî, piştî ku bi hevalên xwe
ve qederê 500 metreyekî bi zikişkê çûn, xwe qulipand ser
tenişta rastê û çavên xwe li gundên ber rêya Talanê gerandin.
Gund bi carekê ve vemirîbûn. Ji hindama Mezrê û
hetanî bi Nisbanê lempeyeke pêketî jî xuya nedikir. Ji lempeyên
vemirî, bi hinera şerê xwe hisiya. Keserek kişand.
Afata ku bi sariya sibehê re eskeran wê bi serê gundiyan de
bianîna di bîra wî de hat û qurpînî bi nava wî ket. Hindik
mabû ku mîna zarokan bigiriya. Çavên wî sist bûn û hinekî
jî xewirîn. Lêbelê zêde li wê afatê nefikirî. Bi qehr xwe
qulipand ser zik, serê xwe bi erdê ve dewisand û vê carê jî
guhên xwe dan ser keft û lepta eskeran. Bi vî rengî du-sê
deqîqeyekî li jêr û jora xwe guhdarî kir. Li jêr pêjna tiştekî
nedihat, lê li jora wan esker di cihên xwe de habela
diqelqilîn û bi wê qelqilandinê jî deng ji sîlehên wan derdiket.
Navbera wan û eskeran 300 metreyek hebû yan tune
bû. Dimdim dîsa bi zikişkê çû û hevalên wî jî dan dû.
Lêbelê hîn 20-30 gavekî neçûbûn hersê helîkopteran ji paş
wan ve dan ber hev û mîna ku ew dîtibûn sarox û fîşek korfelaqî
bi erdê de berdan. Bi agirê ku ji helîkopteran pijiqî,
eskeran jî agir dadan. Lê mîna ku xeteyeke mezin kiribûn,
hema jî teqîna xwe sekinandin. Helîkopteran teqîn domand
û van ên din jî ji hew bêhtir geh bi zikişkê û geh jî li ser
çarlepikan dan xwe. Teqîn bi kêrî wan hatibû. Teqînê û

dengê helîkopteran, dengê xirepişa ku ji wan diçû bi carekê ve fetisandibû.
Dimdim û hevalên xwe bi qasî 700-800 metreyekî ji
44
cihê ku li têlan xistibûn bi dûr ketibûn. Di cihê ku pêşî wê tê re bintêl bûbana, erdê mayinkirî bi qasî 500 metreyekî fireh û li cihê ku niha lê sekinîbûn jî ew erd bi qasî 100 metreyekî zirav bûbû. Seranserê hidûd wilo bû. Li hin cihan ji ser têlê û heta ku digiha rayên trênê, erdê mayînkirî ji kîlometreyekê jî bêhtir fireh dibûn.
Dimdim temamê eskerên ku li jêr û jorê di kemîna wî de rûniştîbûn û diranên xwe lê disûtin xapandibûn. Helîkopter jî. Helîkopteran teqîna xwe sekinandibûn û ha ha li ser cihê wan ê ku li têlê xistibûn nizim gêr dibûn. Him bi ser de jî hewr ferikî bûn, ezman cih bi cih bûbû sahî û bi qasî teqil û nîvekê nêzîkayî li xeta trênê kiribûn. Reşaya xeta trênê ji wan xuyanî dikir. Di vê bêhnikê de li ber wan êdî tu asteng nemabûn.
”Çolo em bintêl dibin; hişê xwe bide ser min”, Dimdim got û bi şîşikên xwe ên kebabê kişiya erdê.
Dimdim heta ku jê hat destê xwe sivik girtin û wek avê bi erdê de çû. Wî çiqasî şîşik bi erdê de birin, şîşik jî ewqasî bi erdê de çûn û wî jî destvala şîşik kişandin. Ji xwe vir bê mayin bûn. Li cihên wilo ku xeta trênê û têlên mayinan nêzîkayî li hev dikirin, hema hema mayin tune bûn. Çend mayinên ku hebana jî ji xeta trênê bêhtir nêzîkî têlan bûn. Dimdim bi wê yeka han baş dizanîbû. Lêbelê wî dîsa jî bi taswasa dil nekir û hetanî ku giha kendalê xeta trênê herwiha

him şîşik bi kar anîn û him jî bi zikişkê çûn.

45

Li gundê Çeynê

Gundê ku şêrgele lê bûn mêhvan nêzîkî xeta mayinan û Qamişê bû. Di eslê xwe de vir ne gund bû, çar-pênc mal bûn. Li seranserî Bintêlê wek vî gundî gelek gundên kohî û çoliyan hebûn. Tarîxa avakirina wan jî ne ewqasî kevin bû. Dewleta Çolistanê di sala 1966an de piştî ku navê Bintêlê kiribû ”Kembera Çolî”, hêdî bi hêdî dest danîbû ser erdên kohiyan, kohî ji cih û warên wan bi dûr xistibûn û di şûna wan de bi deh hezaran çolî bi cih kiribûn, ev gund hatibûn avakirin.

Şêrgele seet li derdora duduyên şevê gihan gund. Gundî jî zû bi wan ve rabûn û bi qedir û qîmet pêşewazî li wan kirin. Gundiyên van deran hema hema hemû jî alîgirên partiya şêrgeleyan û hezêkirên Dimdim bûn û hemiyan jî ji rengê him û gima ku li nav mayinan qewimîbû fêhm kiribûn ku Dimdim li hidûd xistibû. Ji piçûkan pê ve xew bi çavên tu kesî neketibû. Him ne bi tenê bi ê wan, di wê şevê de xew bi çavên temamê gundiyên ku li jêr û jora xeta mayinan diman neketibû. Her kes li gora mercên ku eskeran ji wan re danîbûn tevgeriyabûn, lempe vemirandibûn û bi ax û keser li bendî banga sibehê sekinîbûn. Di şevên ku li ser hidûd dibû teqîn, li jêr û jorê ronahî qedexe bû. Ev mercek bû û mala sertêliyê ku ew merc têk dibir, eskeran jî piçûk û mezinên malê bi asaq û toraqan şerpeze dikirin. Li binya têlê ev ceze hinekî sivik bû. Eskerên Çolistanê xwediyê malê carina bêerz û carina jî bi pereyan cirm dikirin.

Lêxistin jî hebû. Lê bi lêxistinê mirov nedikujtin. Bi
46
lêxistinê ên ku seqet bûbûn hebûn.
Dimdim piştî ku hevalên xwe bi cil kirin û digel wan û
xwediyê malê bi qasî çarîkekê wenisî, destûra ku heta sibehê
li gund nobetê bigire ji wan xwest û bêyî ku li bersiva
kesî guhdarî bike ji hindur derket. Bêhna wî pir teng bû.
Dilê wî bi çavsoriya ku di sibehê de wê eskeran li sertêliyan
kiribaya zewirîbû. Û bi ser de jî ew çavsorî wê di ruyê
wî de li xelkê herêmê bûbaya. Ji tevgera eskeran, danîn û
rabûna helîkopteran û kemîna binya têlê fêhm kiribû ku
hin esker hatine kujtin. Dilerizî, dişewişî û bi rê ve diçû.
Di eslê xwe de wî ji zû de dev ji karê hidûd berdabû. Lê
partiyê ew mecbûr kiribû. Serok Altaxus qederê pênc deqîqeyekî
pê re peyivîbû heta ku ew kişandibû ser hidûd.
Hinavên Dimdim, ji zilma ku di banga sibehê de wê ji
Kertmînê dest pê kiribaya, di ser hev re diqulipîn. Bi gezan
lêva xwe terişandibû. Di van bêhnikan de heger ne ji bîr û
baweriya wî a ku xelasiya xelkê herêmê û temamê welêt bi
partiyê ve girêdabûn û di kar û barên çûn û hatina Sertêl
û Bintêlê de xwe jî wek himalekî partiyê nedîtibaya, ji sedî
sed wê êrîş bibraya ser yuzbaşiyê tabûra Nisbanê. Û bi wê
êrîşê re jî dikarîbû hêza wî ji hev belawela kiribaya.Yuzbaşiyê
ku qederê nîv kîlometreyekê nêzîkî wî bû, hîn jî di
kemînê de bû; kemîn bi rayên trênê ve bû û ji jêra rayan
ve jî kemîn dibû wek lûsê elokan. Û ku dabaya ser lûs, wê
şapat li wan rabaya û yekî jî rêya ber lingên xwe nedîtibaya.
Hin bi teqîna pêşî re dihatin kujtin, hin bi nav mayinan û

hin jî ber bi wî de diterqiyan. Dimdimê ku xwe berdabû
ser qerevîzkan û mîna guran li hêla kemînê dinerî, wilo
47
difikirî. Bi êrîşa xwe şer qezenc kiribû, lê li a ku wê bi dû
wê de bihataya teqinîbû.
”Ez niha dikarim bi hemiyan û yekî ji wan jî sax bernedim.
Lê îcar dawiya wê?”
Bêhnekê fikirî û fêde û zerara şerê xwe da ber hev:
”Gelo dibe ku sibehê li Qamişê û Nisbanê bibe ´roja
haşer û mahşerê!´ Hi?”
Dilê xwe xweş kir û zû bersiva xwe da:
”Ma ji xwe îşev ´roja qiyametê bû´ û melekan jî em ji
nav êgir xelas kirin!”
Vê carê jî kêfa xwe anî:
”Gelo ev melek wê bikaribin temamê qamişî û nisbaniyan
jî xelas bikin?” got û hema birî.
Pirs li hesabê wî nehatibû. Xwe piçûk kiribû.
Ji ber xwe fedî kir:
”Melekên çi û jehra çi!”
Hêrs bû:
”Melekan her derê welatê me ji şeytanan re berdane!”
Kumişî û li ser tenişta çepê ket:
”Kesek ne dostê me ye.”
Xwe bi ser hev de guvaşt:
”Hetanî bi erd û ezmên jî bûye dijminê me!”
Ji nişkê ve rabû ser pêyan û keleşkofa xwe hejand:
”Aha ev melek e, mirov bi vê êrîşê dibe ser temamê
minafiq û şeytanên dinyayê”, got û ber bi minafiq û şeytanên

xwe de meşiya. Lê piştî ku çend gavekî çû, di cih de xwe avêt erdê û guhên xwe dan ser kûçikên ku ji kuç û kolanên Entariyê direyan. Mêrik bi salan şivantî kiribû. Û
48
bi ser de jî li Têrê! Serafê kûçikan bû; zû ji dengê wan fêhm kir ku bi derewan direyan.
Dîsa qerevîzkî rûnişt û li hesabê sibehê fikirî:
”Îcar ku Qamişê û Nisbanê jî mîna gundê Elaqeşmê tev li insên û heywên bişewitînin ez ê çi xweliyê li serê xwe û bavê xwe bikim?”
Li vê pirsê qederekî baş fikirî. Fikirî lê bi haweyê Eliyê Betê lê fikirî. Çengî wê navê bû û mîna şêrekî birîndar niriya:
”Ji tirsa vî bêbavî re sertêliyên me niha hêkên hesinî dikin! Hek, halo naba! Ez divê serê wî ji hev belav bikim” got û ber bi Sertêlê de gav radan.
Zilmê Dimdim xewirandibû. Ji xwe ev wilo bû, gava ku hinekan behsa zilma eskeran jê re dikir, zilma ku eskerên ser hidûd bi xelkê re kiribû mîna filîmekî di ber çavên wî re derbas dibû û bêhemdî xwe hêrs dibû. Bi wê hêrsê çend carekî ji dûr ve li çend qereqolan jî girêdabû.
Xeta trênê nêzîkî wî bû. Gelekî neçû giha ser xetê. Li vir bi xwe hisiya ku şev lê geriyaye û rêya xwe şaş kiriye. Veciniqî û hema pê re jî ji hindam de xwe li ser zik avêt erdê. Lê ji desthilanîn neket. Keleşkofa xwe li hev siwar kir û çavên xwe li derdorê gerandin. Derdor xalî bû û gundê ku lê bûbûn mêhvan jî ji cihê wî xuya dikir. Gund dît. Bi dîtina gund re cihê xwe jî nas kir. Bêhna wî derket. Li qûn

rûnişt û bi hêdîka fîşek ji derba keleşkofê derxist. Bin herîbû lê wî guh nedayê. Ji xwe nedihat bîrê jî. Keysa xwe li rûniştinê xweş kir û berê xwe da Sertêlê. Niha pir bêdeng bû. Bêlept jî sekinîbû. Ji dûr ve wek şikêrên nav rezan û ji
49
nêzîk ve jî wek holikên nav bîstanan xuya dikir. Di vê kêlîkê de gelek tişt bi hev re dihatin bîra wî, lê yekê rê li ber hemiyan girtibû.
Payiza sala 1976an bû. Şeveke reş û bi şilî bû û bi du hevalên xwe ve ji Qamişê, seet li derdora yekê şevê di aliyê Kanîkan re xwestibûn derbasî Nisbanê bûbana, esker bi wan hisiyabûn û ew û eskeran bi sîlehan li ber hev pahn bûbûn. Di dawiyê de esker bi paş de vekişiyabûn û di sikakên Nisbanê de bi hev ketibûn. Di wî şerî de usteymenek, eskerek û hevalekî wî hatibûn kujtin. Wî rahiştibû termê hevalê xwe ê ku mala wî li Nisbanê bû û ew teslîmî dê û bavê wî kiribû. Dê û bavê jî term di nav qirşikên pembo de veşartibûn. Û piştî hefteyekê jî bi şev li nav erdê ku hema bi mala wan ve bû, term bi dizî binax kiribûn.
”Nisbaniyan hesabê wî şerê min pir pir giran dabûn! Komando, komando”, got û kela girî ket qirikê.
Bi sedan komando ji tûgaya Mêrdanê û kolordiya Bekirê kişiyabûn hindurê bajêr û mîna gur û wawîkan xwe dadabûn hinduran.
Giriya. Giriyê wî wek ê pîrekan bû. Dikaland.
“Lawên teresan dora Nisbanê rapêçabûn, çûn û hatin birîbûn, xelk tazî dikirin û di hindurê malan de mirov dikujtin!”

Herdu lepên xwe dirêjî erdê kirin û ax guvaşt:
”Wawîk lawên wawîkan, cilûcawên erebî diavêtin hinduran
û xelk digirtin. Nisbanê kiribûn wek qesabxaneyekê,
ji her derê wê dengê qîr û hewar û nalînan dihat!”
Bi qehr rabû ser xwe û berê xwe ber bi yuzbaşî de vekir:
50
“Haho! Tam yazdeh Nisbaniyên bêguneh kujtin!” got û
meşiya.
“Û hetanî bi çil û du kesên ku ez pê dizanim bi lêdanê
seqet kiribûn. Tam şeş rojan ew zilm bi xelkê re kirin!”
Lezand. Vacavaca diçû û her ji gavekê berê wî dihat
guhertin.
“Bavê Osê”, Osê hevalê wî ê ku hatibû kujtin, “piştî çar
salan nas kiribûn, ro li nîvro ji malê biribûn, li tabûrê kujtibûn
û termê wî jî wek ên gelek belengazan avêtibûn nav
mayinên Kanîkannnn!”
Bêserî beziya, bi vir de û wir de çeng bû û dîsa dest bi
zirtên xwe kir:
“Ê ne ez hatim we! Hûn gurên feqîrk û belengazan in.
De xwe li ber min berazî bigirin, ha! Ez Elîkê Betê me, ez
Hemê Gozê me!...”
Nediqêriya lê dîsa jî dengê wî heta bi gund diçû.
”Dimdim, rehet bitebite, bi te nakeve, ez bi çavekî
mezin li te dinerim!”
Dimdim ew deng nas kir. Bêlept sekinî û di cihê xwe
de sar bû. ”Esker dewlet e û dewlet jî ji van eskerk meskerkên
ser hidûd pêk nayê. Ez bi xwe jî dikarim van eskerkan
hemiyan bikujim.”

Dimdim tam sist bû û dostê wî ê ku ji serî de qilawizî lê kiribû jî ew aliyê wî ferq kir. Hîn bêhtir lê şidand:
”Ma qey vê carê jî tu dixwazî eskerên çoliyan berdî ser zikê qamişiyan?”
Dimdim li ber xwe ket: ”Apê Çeynê temam, temam wilo ye, tu rast dibêjî”, got û xwe lê girt.

51

Dimdimê ku hetanî sibehê sihurîbû, bi ro hilat re di kokela livînên ser xaniyê kelpîçî de rûniştibû û bi dûrbînê li Sertêlê temaşe dikir. Li jor xirecireke mezin û li jêr jî bêdengî hebû. Helîkopterên ku bi şev dabûn dû wan, ji hindama Girê Cinan û hetanî ku digiha Nisbanê nav mayinan ha ha saxtî dikirin. Li ser rêya Talanê gelek terempêlên eskerî bi dû hev de sekinîbûn. Bi dehan esker li cihê ku şêrgeleyan li hidûd xistibûn, garankî belav bûbûn û derdor saxtî dikirin. Gelek jî li ba têlên ku hatibûn birîn tevdigeriyan û têl bi hev ve girêdidan. Kertmînê vemirî xuya dikir.
Ji terempêlên eskerî ên ku li nav gund sekinîbûn û eskerên ku hilkişiyabûn ser xaniyan, mirov baş tê derdixist ku eskeran dîsa gundî bi carekê ve derxistine ser bênderên jora gund û asaq di wan de dikirin. Ji xwe ji wê sala ku mayin hatibûn danîn û hetanî roja îro, karê van gundiyên ser keviya mayinan her ev bû. Di dema qaçaxçiyan de ji ruyê qaçaxçiyan û di dema şêrgeleyan de jî ji ruyê şêrgeleyan lêdan dixwarin, dihatin girtin û kujtin.
Şerê Dimdim li ser xelkê herêmê giran rûniştibû. Di şer de eskerek û du sivîlên ku yek ji Qamişê û yek jî ji Nisbanê bû hatibûn kujtin û du esker û sivîlek jî birîndar bûbûn.

Ê sivîl xortikek bû. Ji sînemeya Kaplan dihat û diçû malê. Birîna wî hinekî sivik bû. Gule lûleyeke zendê wî şikenandibû. Lê birîna herdu eskeran giran bû. Gule di newqa wan re firiyabû û ew nîvmirî rakiribûn nexweşxaneya Bekirê. Di eslê xwe de heger ew şer di şeveke biharê, havîn û payizê de qewimîbûya, hejmara kujtî û birîndarên sivîl, li gora ên niha wê pir zêde bana. Xelkê herêmê bi mehên biharê re

52

hildikişiyan ser xaniyan û hetanî dawiya payizê jî herwiha li ser xaniyan şevbihêrk dikirin û radizan. Di wan mehan de li seranserî xeta mayinan, piçûk-mezin, li jêr û jora xetê gelek kes hatibûn kujtin.

Dimdim bi qasidê xwe ê ku bi sariya sibehê re ji gund şandibû Qamişê û vegeriyabû, li hejmara kujtî û birîndaran hayî bûbû û ketibû taya ku ji niha û pê ve bi destên yuzbaşiyê tabûra Nisbanê û eskerên wî, gelo çend sivîlên din hatibana kujtin? Gelo wê ji kolordiya Bekirê dîsa komando hatibana Nisbanê û girtibana ser malan? Çira çend malan dihat tefandin û çend zarok sêwî mezin dibûn? Cimcimê serê wî bi van pirsan zewirîbû. Li jora xetê her tişt li ber çavên wî bûbûn esker û komando; her reşê ku bêlept jê xuya dikir wek kujtiyekî didît û axîn dikir xwîn. Di dawiyê de xwe negirt û dûrbîn avêt; bi hêrs destê xwe dirêjî medalya ku di stû de bû kir û ben kişand. Benê medalyayê qalind û naylonî bû, ben neqetiya û medalya ku bi qasî nalekî mezin bû bi destê wî ve hat. Medalya ji zêr bû û bi sûretê Serok Altaxus hatibû kolan. Li sûret nerî û hey nerî. Sûret di çavên wî de bû wek Firewnê duduyan. Lerizî.

Medalya bi tiliyên xwe ên ku wek destîbiviran bûn eciqand
û heta ku jê hat li erdê xist. Li erdê jî tibabekî lê nerî. Vê
carê jî kufletê wî hat bîrê. Li derdora çar salan bû ku ji
malê derketibû, kuflet perîşan bûbû, keça wî a hîjdeh salî
ji malê reviyabû û ketibû rêya xerab. Ji Serok Altaxus pir
xwestibû ku hema ji bo carekê ba jî li Bintêlê li cihekî bi
darî kufletê xwe ketibaya. Lêbelê Serok Altaxus ew daxwaza
wî di warê tekoşîna kohitiyê de wek qelsiyekê dîtibû û
53
pê de xeyidî bû.
Dimdim pê li medalyayê kir. Bi pêlêkirina rûniştkî kela
dilê wî hênik nebû. Rabû ser xwe û heta ku medalya di bin
lingê wî de windabû bi erdê ve dewisand. Heger ji hindurê
malê Çeynê bangî wî nekiribaya, dibû ku bi wî haweyê
pêlêkirina xwe xanî jî qul kiribaya. Di wê bêhnikê de ji
Serok Altaxus hatibû bêvilê. Wî ji zû de dev ji hidûd berdabû,
mala xwe biribû Hovistanê û li derdora Monîsayê
darteraşî dikir. Rewşa wî zêde xweş bûbû. Pênc zarokên wî
hebûn û herpênc jî di xwendegehan de bûn. Him wî û jina
xwe jî pir ji hev hez dikir. Û Serok Altaxus jî ew ji wêqasê
bi dûr xistibû û ew kiribû berpirsyarê temamê hidûdan.
Tew bi ser de jî ew bi xelata xwe a herî mezin xelat kiribû.
Cara pêşî bû ku partiyê ”Medalya Şerefa Serok Altaxus” bi
wî vekiribû. Serok Altaxus bi merasimeke mezin û bi destên
xwe medalaya şerefa xwe xistibû stuyê wî. Wî jî destê Serok
Altaxus maçî kiribû, jê re soz dabû û ji wê rojê ve ji dil û
can bi karê xwe rabûbû û ha ha xwe li nav mayinan qelibandibû.
”Hevalê li ser xênî, zû were taştê bixwe da tu bi wext

bidî ser rêya xwe!”
Dimdim bi dengê Çeynê re li xwe werqilî; rabû ser xwe
û vê carê jî rabûkirî ponijî. Bi xwe hayî bûbû ku tiştekî
xerab kiriye, lê xerabiyeke çawa bû rê nedibir ser. Ew hîn
li wê yeka han difikirî û Çeynê ji devê derî dîsa lê qêriya.
Dimdim bi dengê wî re dûrbîn li şûna xwe hişt û hema xwe
bi neqebên xênî de berda. Ji xwe tiştekî ku bikira jî nemabû.
Eskeran li gundên jora xetê piçûk û mezin garankî
54
dabûn ber xwe; destên wî negihabûn eskeran, ji Serok Altaxus
hêrs bûbû û Serok Altaxus jî bi ser hev de pelixandibû.
Dimdim çawa ku ji derve de het, wilo jî kişiya ser
sifreyê û eskerkî rûnişt. Taştê nanê sêlê, zeytûn û mastê
çêlekê bû. Çayê jî hebû. Lê wî çayê venexwar, du nanên
sêlê bi du gepan re berdan hûrê xwe, tasek mast qurt kir û
bêyî ku tiştekî bibêje ji ser sifreyê vekişiya. Ew şêweyî wî
bala şêrgeleyan kişand û her yekî ji hêla xwe ve di bin çavan
re awir tê de firandin.
”Dimdim hewar xelas bû, baran ferikî û berbûk hetikî,
êdî aqilê xwe bîne serê xwe da tu zû neyê kujtin. Hevalo,
tu ji Serok Altaxus re hîn pir lazim î”, Çeynê got û nanek
dirêjî destê wî kir.
Dimdim nan ji dest girt. Çeynê tasek mast jî dayê. Wî
ew jî ji dest girt. Çeynê heta ku kevçî pê ve gihand, wî dawî
li nên û mêst anîbû jî. Çeynêyê ku xelkê herêmê bi çavên
fîlozofan lê dinerî, serê xwe anî ber devê wî û bi hêdîka jê
re got:
”Kuro tu ne li ser hişê xwe yî. Rabe erebkî serê xwe bişo

da hinekî bêhna te derkeve.”
Dimdim nepeyivî. Wek bûmekî xwe dabû ser hev û bi
tenê hew lê dinerî. Di van kêlîkan de temamê hişê xwe berdabû
ser wê xerabiya ku kiribû û carekê bi ser venedibû.
Aqilê wî li hev geriyabû.
Çeynê dev jê berneda:
”Ji şevê din ve xew neketiye çavên te. Heyran rabe here
odeya malê û çend seetekî çavên xwe nerm bike.”
Ev yekî wilo bû ku gava lê diqewimî du şevekî li ser hev
55
ranediza. Û gava ku keys lê dianî, 15-16 seetekî jî radiza.
Dimdim bêdilî xwe got:
”Apo ewqas tişt di serê min de diçin û tên ku” sekinî û
dîsa fikirî.
Çeynê bi haweyê ku ber dilê wî bigire tena tena û giran
peyivî:
”Lawê bavê min, heta ku mirov hebe wê tişt jî her
hebin. Îcar a bedew ew e ku mirov bi gelek tiştan danekeve
da barê mirov jî ewqasî giran nebe. De rabe here rakeve,
here here!”
Dimdim beşişî:
”Ez bixwazim rakevim jî ez ê nikaribim rakevim, gelek
tişt bi hev re tên bêr çavên min.”
Çeynê piştî ku qederê hilmekê lê nerî, ”vî benî stuyê te
biriye”, got û destê xwe avêt ben.
Çavên Dimdim çûn nîvê serê wî, hişk bi destê Çeynê
girt, destê wî bi wir de pekand, bi bez ji hindur derket û
bêmefer bi neqebên xênî ve hilkişiya. Li ser xênî pir nema,

vegeriya û ji kebaniya malê şûjin xwest. Piştî ku kebaniyê şûjin dayê, dîsa bi wê temtêla berî niha hilkişiya ser xênî û di kokelka livînan de medalya xwe a ku ji qulpik kiribû, qul kir. Cihê bi qul xerimî xuya dikir. Dû re ben di qulikê re derbas kir, medalya mîna Quranê sê caran li ser hev maçî kir û bi kelûgirî ji xwe re got:

”Cidê min ya Serok Altaxus, ez li himberî cenabê te ê pak gunehkar im! Ez çi tajî û çi kûçik im ku ez ê bikaribim pê li wî cenabê te ê pir avzel bikim! Tobe, tobe, tobe, min bibexişîne!...”

56

Dimdimê ku bi ser sûcê xwe vebûbû û istixfara xwe anîbû, êdî niha li ser hişê xwe li odeyê bêdeng rûniştibû. Ji bilî Çeynê her kes li keft û lepta wî ecêbmayî mabû. Ev cara pêşî bû ku hevalên wî ew di rewşeke wilo bi mitale û tewşomewşî de dîtibûn. Hemû li ber diketin, lê yek ji wan jî bi ecêba Çolo li ber nediket! Remo bi haweyê ku ber dilê wî digirt ji felsefeya Serok Altaxus dipeyivî:

”Hevalê Dimdim, dermanê temamê derd û kulan Serok Altaxus e. Ji qudreta wî a mezin pê ve gerek mirov tiştekî din nebîne û guhê xwe nede tiştkî din!…”

Ew hîn wilo dipeyivî û Çolo jî ji nişkê ve a di dilê xwe de got:

”Kekê min ê herî mezin Dimdim, bawer bike ji bo ku ez bikaribim dilê te xwş bikim, tiştekî ku ez ê ji bo te nikaribim bikim tuneye. Bes hema bibêje bê çî ye ew tiştê ku tu ne rehet kiriyî.”

Çeynê bişirand:

”Heyran dev ji Dimdim berdin, qey hûn dixwazin ku vê carê jî Serok Altaxus ji dêvla ben û menan ve, werîs merîsan têxe stuyê wî.”
Remo dengê Çeynê nebir xwe, awirek dijwar di Çolo re firand, lê nerî û peyivî:
”Ji bo Serok Altaxus mirov dikare her tiştî bike. Him ji xwe ev prensîpekî partiyê ye.”
Zinêr bi dilpijokî da ber:
”Heval pir rast dibêje. Ji bilî hezêkirina Serok Altaxus, temamê hezêkirinan sixte ye…”
Zinêr keysa xwe li gotinê xweş kiribû, lê Sîpên gotin ji
57
dev girt û bi haweyê ku henekê xwe bi wan bike peyivî:
”Heval, mirov carina dibêje ku qey we tiştekî partiyê nexwendiye. Lê ma we qet hema li hevalekî sereke jî guhdarî nekiriye. Hezêkirina Serok Altaxus prensîpê partiyê ê herî sereke ye. Ji bilî hezêkirina Serok Altaxus, temamê hezêkirinan sixte ye û herwisa jî sûc e.”
Meto ecêbmayî lê nerî û bi hêdîka got:
”Yanî gava mirov ji dê û bavê xwe û zarokên xwe hez bike sûc e, ha?”
Remo wek sofiyê di hizûra şêx de, serê xwe rakir û bi dengekî qerisî ew bersivand:
”Erê heval, erê sûc e. Sûc e dibêjim ji ber ku gava mirov ji wan hez kir, hezêkirina Serok Altaxus kêm dibe.”
Metoyê heftê salî serê xwe hejand:
”Heyran wilehilezîm ez ji kebaniya xwe pir hez dikim”, got û di ber xwe de hinekî beşişî.

Sîpan soromoro bû û destê xwe bi ser de hejand:
”Heval, tu sûcdar î! Partî wê vê dijminahiya ku tu bi serokê neteweya kohî re dikî ji te qebûl neke. Tew hîn jî dikene, hi!” got û bi qûnkişkê ber pê de çû.
Çeynê piştî ku ji Sîpên re got wek ”camêran li cihê xwe rûne”, berê xwe da Meto û bi ser de hilbû:
”Bitebite Meto, te ez li parsê hesilandim! Cihekî te î ku min ji partiyê nekirî be ne maye, bes e! Min ji partiyê bêvila te bi pênc sed wereqî kirî, her diranekî te bi sihî, her guhekî te bi sê sedî, her çavekî te bi hezarî, zimanê te bi sê hezarî û kîr û gunên te jî min tam bi deh hezarên qut î girover kirîn, rihet rûne!...”
58
Jina Meto ji devê derî dengê xwe rakir:
”Kekê Çeynê, ma bi tenê hew ew, dest û lingên wî jî bibêje. Û ew tofana pereyên ku te li wî serê wî ê xerabe da!…”
Çeynê bi gotinên jinikê re hîn bêhtir lê sor bû:
”Kuro lawo tu tam bi sed û bîst hezarên çolistanî li ser min rûniştiye. Bi tenê hew min qûna te nekiriye. Ew jî miheqeq wê nehatibe bîra partiyê. Binere vê carê jî wê partî bixwaze ku qûna te jê bike yan jî dax bide û ez ê jî nikaribim wê bikirim; kuro lawo bitebite, haho ji destê te!”
Çeynê bi vî zarî kişiyabû ser Meto û Meto jî ziq li neviyê Çeynê û şêrgeleyan dinerî. Nevî û şêrgeleyan ji hev re ha ha digotin ”heval” û bi hev re bi çavgirtînkê dilîstin.
Di dawiyê de Meto xwe negirt:
”Birano, li welatên Ewrupayê qedexe ye ku mezin ji

zarokan re bibêjin heval. Dewleta Swêdê li ser wê yeka han du hevalên we ên ku li zarokxaneyên swêdiyan kar dikirin, ji kar avêtibûn. Bi zarokan re wilo nepeyivin. Hûn exlaqê wan xerab dikin, nabe ku…”

Remo nehişt ku ew a bi dû ”ku” de bibêje, bi qîjewîj jê re got:

”Kûçik, emerîkanciyê emperyalîst û bêşeref, tu bi çi cesaretê dikarî partiyê bi bêexlaqiyê tawanbar bikî” û ji cihê ku lê rûniştibû xwe tê werkir.

Li şensê wî û Çeynê, heger Dimdim zû bi wan ve ranebaya, Remo wê bi kulma duduyan re vê carê jî du diranên Çeynê anîbana xwarê. Çeynê bi raberdana Remo re bûbû xwê û ketibû êgir. Li hêlekê ew û li hêla din jî jina wî diqê-

59

riya, şêrgele bêminet kiribûn û doza ku ji gund ”biqeşitin” li wan dikirin. Meto jî nîvhişî li wê navê veziliyabû û ha ha xwîn ji devê wî diherikî.

Meto mirovekî ku têra xwe dinya dîtibû. Welatekî Ewrupayê nemabû ku lê ne geriyabû. Digel ku hosteyê dereseyan (bîçeran) bû, wilo jî ji temamê terempêlên li Rohilata Navîn fêhm dikir. Wî li dor çil-pêncî salekî hosteya deraseyan kiribû û qencî û xerabiya Emerîka û Rûsyayê di perçeyên deraseyan de ji hev nas kiribû. Li gora wî perçeyên ku malê rûsan bûn qelp bûn; perçe yan zû dişkestin û yan jî zû xerab dibûn û perçeyên ku malê emerîkiyan bûn jî bi salan tişt bi wan nedihat. Aha meseleya ku Meto ji emerîkiyan hez kiribû hemû ev bû û partiyê jî li ser wê yeka han fermana wî rakiribû. Partiyê pêşî destê wî

bi carekê ve ji xebatê kişandibû û hetanî bi siwarbûna terempêlan jî lê qedexe kiribû. Lêbelê piştî ku Meto cezeyê partiyê bi xwe nexweş anîbû û li vir û wir dîsa gotibû ”bavo willehî heya bi birxe, pense û çakûçên emerîkiyan jî ji ên urûsan saxlemtir in”, partî tam jê hêrs bûbû û çend şêrgeleyên xwe rêyî mala wî kiribûn. Şêrgeleyan jî piştî ku ew di malê de bi lêdanê tirek kiribûn û xwestibûn ku guhên wî jê bikin, Çeynê pê ve gihabû û herdu guhên wî ji wan kirîbû. Bi rastî jî wek ku Çeynê digot, Meto ne yekî seknokî bû. Her ji çendeyekî wê pesnê alavên emerîkiyan dabaya û partiyê jî wê qesda jêkirina lebatekî wî kiribaya. Çeynê pê re mabû heyirî. Ji zarokiya xwe de pê re bûbû heval û bi wê hevaltiya ji dil û can bi hev re pîr bûbûn. Di eslê xwe

60

de asas ne Meto, bintêliyan Çeynê li pataxê xistibûn. Çeynêyê ku di nav bintêliyan de wek dewlemendê sisêyan bi nav dibû, temamê malê xwe li ser jêkirina guh û bêvilên kohiyên wek Meto kiribû. Tew bi ser de jî keçek wî û du lawên wî bûbûn şêrgele û hersê jî hatibûn kujtin.

61

Buroya Şoreşê

Dimdim û Çolo çûn destê Çeynê û Meto û lêborîna xwe ji wan xwestin û ên din jî bi zirt û pirtan ew dan ber hev û hemû bi hev re ji gund derketin.

Ezman sahî bû. Tîrêjên rokê vêl kişiyabûn erdê û dinya hêdî bi hêdî germ dibû. Sûka Qamişê tevdigeriya. Dengê qorneyên terempêlan di erşên felekan re derdiketin. Terempêlan mîna gêrikan girtibûn ser rêyan û her a ku di ber şêrgeleyan

re derbas dibû li qorneyê dixist. Lê şêrgele jî li yekê
ji wan hayî nedibûn, serê xwe berdabûn ber xwe û bi qehr
diçûn. Bi hev re nedipeyivîn. Dimdim û Çolo xwe dabûn
aliyekî rê û ên din xwe dabûn aliyekî. Qonaxa wan a pêşî
Qamişê bû. Li Qamişê buroya wan a şoreşê hebû û bi rêya
wê buroyê wê xwe gihandibana Keleha Mezlûman.
Ji gund hetanî bi Qamişê bi meşê çil deqîqeyek dikişand,
lê wan di bîst deqîqeyekî de xwe gihandin bajêr û
yekser çûn Buroya Şoreşê. Buro xaniyekî ji kelpîçan bû û
ser xênî jî bi dar û beştan û pûş û pelaxê hatibû nixumandin.
Dîwarên vê buroya neseyandî yekî jî li yekî nedixwar;
hemû vêl û zikdayîbûn. Heger ne ji ala ku bi serê mircaqekî
ve li ber devê deriyê wê daliqandîbûya, ji xwe mirov wê
qet bîr nebira ku xanî ye. Wî xanîkê ku ji dûr ve mîna mêşdana
bê kewar xuyanî dikir, bi ala Çolistanê ji nav erdê
mayinan jî bêhtir xof dida!
Li vê buroya ku tebeqeyeke wê di bin erdê de û yek jî
li ser ruyê erdê bû, du keçên qamqutî û çîçelaskî li bendî
şêrgeleyan sekinîbûn. Çawa ku şêrgele derbasî hindur bûn,
62
herdu keç bi wan ve rabûn û bêyî ku xêrhatinê di wan de
bidin Dimdim xewleyî derve kirin. Piştî çend deqîqeyekî jî
li Çolo vegeriyan û herçar bi hev re ber bi texsiya ku ji
sariya sibehê de ji Buroya Şoreşê hema bi wir de sekinîbû
meşiyan. Şifêr eskerkî pêrgî wan ve hat û bi zimanekî lerzok
ji herdu keçan re got:
”Heval, ev herdu heval divê bi hutobosê yan jî bi terektorekê
biçin. Texsiya min nikare rahije wan; em ê bi rêyan

de bimînin.”
Keçan bi zirt gotina wî birîn û bi ser de hilbûn:
”Kundiro”, navê wî Hemzo bû, ”tu çawa dikarî bibêjî texsiya min? A min tuneye, a me heye. Her tiştê kohiyan û Kohistanê malê partiyê ye. Û em hemû jî bi Serok Altaxus hene…”
Kundirê ku alîgirekî partiyê bû her çiqasî digot ”temam heval, gotinek bû û ji devê min derket, min bibexişînin”, xêr nedikir. Keç lê sor bûbûn û yek ji yekê pê dixistin.
Heger Dimdim jî xwe avêtiba pişt keçan, ji sedî sed keçan wê Kundir jî rêyî mehkemeya partiyê kiribana û mehkemeyê jî wê ew bi zimanjêkirinê ceze kiribaya. Lêbelê Dimdim bi berger û lavlavkê keç qanih kirin û hetanî soza ku Kundir neşînin mehkemeyê ji wan nestend jî li texsiyê siwar nehat.
Dimdim li paş şifêr û Çolo jî di tengala şifêr de rûnişt û bi dilekî şikestî ji Qamişê bi rê ketin. Kundirê 50 salî bi raberdanên keçan li ber xwe û Dimdim û Çolo jî li ber partiyê ketibûn ku partiyê herdu keçên 17-18 salî kiribûn nûnerên Buroya Şoreşê. Bêhna Kundir ji a herduyan teng-

tir bûbû û Kundir bi wê bêhntengiyê heta ku gihan Dêrqerasê bêsekin sê seetekî ajot. Li Dêrqerasê piştî ku li ber benzînxaneyekê sekinîn, Kundir çû aşxaneyê, Dimdim bi qedemgehê ve beziya û Çolo jî li wê navê çû û hat. Ew hîn wilo di wê rewşê de bûn û ji nişkê ve texsiyeke mercedes hat û li kêleka texsiya wan sekinî. Şifêrê texsiya mercedesê mîna pisîkê ji cihê xwe çeng bû û bi bazdan çû deriyê texsiyê

ji ê din re vekir. Çolo jî ziq li hindurê texsiyê dinerî.
Lê piştî ku mêrik ji texsiyê daket, vê carê jî Çolo bêyî ku
li xwe hayî bibe bê çi dikir, ber bi ê ku daket de meşiya û
bi haweyekî balkêş ha ha lê nerî.
Mêrik mirovekî kin î zikmezinî bû. Çefiyeke sipî li serî
bû, li ser çefiyê egaleke reş û şifqeyeke qehwerengî jî li ser
egalê bû. Bêcemeyekî sipî û delingfireh li xwe kiribû. Bi ser
bêceme de kirasekî sipî û bi ser kirês de jî çakêtekî reş berdabû.
Qundera wî a kabikbilindî mîna çermê marê reş dibiriqand.
Telefon di vî destî de, tizbî di wî destî de û çixareyek
malboro jî di serê lêvên wî de çikilandî bû. Çolo li
pevgirêdana wî mabû ecêbmayî. Xuya bû ku wî di xewnên
şevan de jî mirovekî bi vê temtêla niha nedîtibû. Di dawiyê
de mêrik ew rewşa Çolo ferq kir, berê xwe da wî û bi çolî
bi ser de hilbû. Çolo nizanîbû bê çi digot, lê baş dizanîbû
ku xeberên pîs jê re didan. Tifî wî jî dikir. Li şensê wî ku
Kundir zû pê ve giha. Mêrik şûxekî herêmê bû û li Çolo
hatibû xezebê. Heger Kundiro xwe pir jê re danexistibaya
û neçûbaya destê wî, dibû ku vî şûxî Çolo li wir bidaya
kujtin. Kundir bi Dimdim re wilo dipeyivî.
Şêrgeleyan piştî bêhnvedaneke li ser lingan bi kêf ji ben-
64
zînxaneyê dan rê. Kêfa wan jî hemû li ser bûyera ku di navbera
Çolo û şûx de qewimî bû. Dabaşa mijara wensa wan
bi carekê ve bûbû ew. Lê çi fêde hîn nîv seetek rê neçûbûn,
vê carê jî tiştekî ku qet ne di hesabê wan de bû derketibû
pêşiya wan. Kalekî perixî di nîvê rê de rûniştibû û ha ha
destê xwe ji terempêla wan re dihejand. Kundir ne ê seknêbû

û bi ser de jî ji haweyê rûniştina kalo hêrs bûbû.
“Lê bisekine”, Dimdim got û milê wî hejand.
Kundirê ku xwîn rijiyabû çavên wî, guh nedayê; hîn
bêhtir pê li gazê kir û got:
“Çolî ye, dev jê berde.”
Dimdim vê carê jî ew circirand û dengê xwe lê rakir:
“Ez ji te re dibêjim kafir be jî lê bisekine.”
Kundir di dawiyê de sekinî lê piştî ku serê kalo bi erdê
re kiribû nanik sekinî.
Dimdim çawa ku ji terempêlê daket û kelaxê kalo di wê
rewşa kambax de dît, soromoro bû, kufîniya marekî pê ket
û ber bi Kundir de meşiya:
”Bêxîret, ew çawa ûjdan e ku tu dikarî pê li kalekî wilo
feqîr û perixî bikî! Insan insan e, ha çolî, ha hovî, ha kohî
em hemû ebdê Xwedê ne. Zalim li her derê zalim û feqîr
jî li her derê feqîr e!” got û bi kulman, şiqam û pehînan ew
da ber hev.
Dimdim hetanî ku Kundir bi lêdanê li erdê rast nekir ji
ser Kundir ranebû. Heger ne ji Çolo baya belkî ew kujtibaya
jî. Çolo bi berger û lavlavkê xwe jê re kir erd heta ku
dev jê berda. Digel ku dev û ruyê Kundir di nava xwînê de
hiştibû û çend parsuyên wî şikenandibûn, hîna jî kela dilê
65
wî hênik nebûbû. Piştî ku termê kalo ji rê derxist û fatîheyek
li ser ruhê wî xwend, dîsa li Kundir vegeriya; bi
herdu lepan wek ku mirov rahije zarokekî yek salî rahiştê,
bilind kir û ew di nav lepên xwe de kilkiland. Dû re bi
lingê wî girt, qêriya û mîna qerpalekî li dora xwe zîzikand

û heta ku jê hat ew bi nav beyarê de avêt. Kundir mîna gokê li erdê ket, pengizî, bilind bû, cardin ket û li erdê zîz bû. Mêrik bi qasî mişarekê ji rê dûr ketibû. Di wê navê re jî Çoloyê ku ji tirsan mîna qişûvê zer vedabû bêhis û pis sekinîbû û bi xof li herduyan temaşe dikir.
Dimdim Kundir ceze kiribû lê hîn jî bi cezeyê xwe ê ku dabûyê qayil nebûbû. Vê carê jî bi bazdan kişiya ser cendekê wî. Kundir jî temamê hişê xwe berdabû ser wî, bi çar çavan lê dinerî û ji tirsan xwe bi ser hev de kilox kiribû. Lêbelê dilê Dimdim pê neşewitî, çawa ku giha ber pehînek li termaza wî xist. Bi pehîna wî re dengê tajiyekî ji Kundir hat, giriya û stuyê xwe li ber lingên wî dirêj kir. Dimdim hîn bêhtir jê hêrs bû, sê carî li ser hev tif ruyê wî kir, ”tu jî zilam î, ha”, got û jê bi dûr ket.
Dimdim bi qasî ku di nav mayinan de bi ser ketîbû wilo jî şifêrekî temam bû. Ji texsiyan û heta ku digiha otobus û qemyonan dizanîbû biajota. Li Hovistanê hînî wê şifêriyê bûbû. Ajotnameya wî jî hebû. Lê ji ber qezeya ku çend sal berê li nav hoviyan kiribû û di wê qezeyê de jî pîrejinek miribû, ajotname çirandibû. Bi wê jî bi tenê nemabû; li xwe heram kiribû ku tu carî terempêl neajotibana. Û niha jî bi ajotina terempêlêke ku pîremêrekî belengaz kujtibû rû bi rû mabû. Çolo ne şifêr bû, şifêrê wî bûbû qesas û ew jî
66
sûndayî bû. Pêşî li dora terempêlê zîvirî û mîna ku li bavkujtiyê xwe binere wilo li terempêlê nerî. Dû re sekinî, berê xwe da Çolo û bi dilekî şikestî jê pirsî:
”Ma tu jî nizanî biajo?”

Çolo destê xwe hejand û li belengaziya xwe tewirand:
”Tew, tew, tew, ku şifêrî bi min mabe me top avêt!”
”Heyran, ji min û te divê yek ji me vê bêxwediya terempêlê biajo.”
”Ezbenî, bi qasî ku ez li keran siwar hatime wilo li terempêlan siwar nehatime. Ez li ku û şifêrî li ku!”
Dimdim dirêj nekir, pir bi hêrs çû ser direksyonê, “zû siwarê”, got û deng bi motorê xist.
“Kundir ma, me Kundir hişt, Kundir, Kundir, Kundir maaa!”
Dimdim dengê xwe lê rakir:
”Ê ne ew zebeş jî be ez ê wî nebim; qut bike”, got û bi wehc pê li xazê kir. Wî çiqasî pê li gazê kir, rê jî ewqasî li ber vebû û mîna guleyê tivingê çû. Ji cihê ku terempêla wan li kalo qelibîbû û heta Keleha Mezlûman şeş-heft seetek hebû. Lêbelê Dimdimê ku bi rê de du carî bi qasî çend deqîqeyekî sekinîbû, di hikmê pênc seetekî de xwe gihand Kelehê û terempêla xwe li hewşa Akademiya Şêrgelan sekinand. Ber êvarê bû û li hewşa akademiyê bi qasî du sed şêrgeleyên ku ji jin û mêran pêk dihatin, eskerkî sef girtibûn û di temeneyê de li bendî emirê serşêrgeleyê xwe bêhis û pis sekinîbûn. Dimdim jî çawa ku ji terempêla xwe daket, di cihê xwe de çik sekinî û ji Çolo re got:
67
”Tu jî mîna min bisekine heta ku heval sûnda xwenasiya miletî bixwin.”
Çolo bi a wî kir. Piştî ku şêrgeleyan sûnd xwarin, vê carê jî Dimdim jê re got:

“Di derbarê jîn û jiyana hevalên akademiyê de gelek tiştên ku divabû min bi rê de ji te re gotibana hebûn, lê nalet li wê rêya me a bêqidoş bê ku hiş di serê min de nehişt. Îcar hevalo, guhê xwe baş bide ser min û min çi got wek min bike. Binere, li vir dan û stendin û tevgera hevalan yekser bi zimanê hovî ye. Zimanê kohî ne qedexe ye, lê dijminahiya li ser zimanê kohî ji qedexa bi devê tivingê jî xerabtir e yanî! Li mirov naxînin û nakujin, lê xwezî bi lêdan û kujtinê ba û ne bi wê qeşmeriya wan ba. Gava mirov bi kohî dipeyive, ew mirov zir ehmeq dibînin; bi çavekî wilo piçûk li mirov dinerin ku mirov ji fediya dixwaze di bin herheft tebeqeyên erdê re here xwarê. Îcar tu dizanî, te divê bi kohî bipeyive û te divê jî bi hovî.”
”Êdî piştî van gotinên te ên ku ez bi carekê ve ji kohî sar kirim, nizanim çi bibêjim. Hoviya min a sikakê ye û bi ser de jî ez bi wê hoviya sikakê jî baş nizanim.”
“Xem nake, xem nake, bi wê hoviyê bipeyive ew ê te hîn bikin.”
“Yanî bi hoviya min a tirovirî nakenin, ha?”
”Na, na, tam bermeqlûbî wê, wê kêfa wan pir bê.”
Çolo xwest ku xwêziya xwe daqurtîne, xwêzî giran çû û stuyê wî mîna dîkê ku li zelqa xwe dinerî, ber bi erdê de kişiya. Dû re jî di ber xwe de got ”temam, ez ê jî bi hovî bipeyivim” û bi dengê pêpîka serşêrgele re hema ket teme-
68
nê. Dimdim jî ket temenê.
Serşêrgeleyê ku bi şêrgeleyên xwe re ev herduyên din jî kontrol dikirin, piştî dît ku herdu jî ketine temenê, xwe bi

ser hev de guvaşt û bi hovî qêriya:
”Afrîner?”
Şêrgeleyan bi hev re û bi dengê herî bilind gotin:
”Serok Altaxus!”
”Bav û bapîrên me çi bûn?”
”Netiştek bûn!”
”Kê em ji çiquliyê darekê afirandin?”
”Serok Altaxus”
”Em çi bûn?”
”Em kurmikek bûn!”
”Kê em kirin insan?”
”Serok Altaxus!”
”Kê şexsiyet da me?“
”Serok Altaxus!“
”Serok Altaxus çî me ye?“
”Roja me ye!“
”Ma bi tenê hew ew?“
”Na, na, na!
Jiyana me, hewa me,
dil û can û ruhê me,
Serok e her tiştê me!“
Serşêrgele dîsa li pêpîkê xist.
Ev lêxistina pêpîka wî jî dihat wateya ku êdî xala ”afrîner“
xelas bûye û niha ew ê derbasî xala ”baweriyê“ bibin.
”Bawermendî!“
69
Hemiyan bi yek dengî sê carî li ser hev gotin:
”Bi xwîn, bi can, bi ruh em bi te re ne, ey Serok!”

Serşêrgele dîsa li pêpîkê xist; û vê carê jî bi wî dengê
xwe ê herî bilind got:
”Fedekarî!“
”Ser bi qurban,
can bi qurban,
hemû bi qurban, ey Serok!“
Şêrgeleyan eva han jî bêwestan tam şeş carî li ser hev
gotin. Dû re serşêrgele di wateya ku ew ê niha herin şîvê
bixwin, bi dû şîvê de perwerdeyeke din bibînin û bi dû perwerdeyê
de jî hema razên, sê carî li pêpîkê xist û tev de di
temeneyê de bi lez ber bi xirbeyekî mezin de meşiyan.
Rewşa li meydanê pir bala Çolo kişandibû. Di serê sefa şêrgeleyan
de gelek kesên ku wî ew wek parlamenter, ebûkat,
mihendis û doktor nas dikirin û di civata wan de rûniştibû
hebûn.
”Dimdim, heval hemû jî ji Têra me, Omarê û herêma
Botê ne. Wey kuro, doktor, mihendis û ebûkatên me tev
de li vir civiyane! Çend parlamenter jî hene. Xuya ye ez pir
dereng mame”, got û keserek kişand.
Dimdim jî serê xwe bi gotinên wî re dihejand û berê
xwe dabû şêrgeleyê ku bi keleşkofê ber bi wan ve dihat.
”Heval, hûn bi xêr hatin vî dergahê miqedes”, ê şêregele
got û rahişt destê Dimdim. Dû re jî rahişt destê Çolo,
nepeyivî û hersê bi hev re rast ber bi wî xirbeyî ve meşiyan.
Lê hîn pênc-şeş gavekî neçû bûn, Çolo sekinî û bi çar
çavan li cawê ku bi qormaxa deriyê xirbe ve daliqandîbû
70
temaşe kir. Li ser cêw bi boyaxa sor û bi tîpên mezin wilo

nivîsîbû:
”Şer mêranî ye!
”Aşitî tirsonekî ye!”
Çolo ew nivîs ne carekê bi tenê, bîst carekî xwend. Û heger Dimdim bi destê wî negirtiba û ew nekişandibaya, belkî du sed carekî jî xwendibaya. Nivîsa ku ji tevna hinavên wî re bûbû hepo û ha ha li kezeba wî dixist, temamê canê wî zewirandibû û dilê wî di mêrxasiya wî a têranî de raxistibû. Damarên eniyê mîna rotên rezan bi ser ruyê wî ê çaroxî de kişiyabûn. Porê serê wî gij bûbû û ji Dimdim re digot ”pir rast e, wilo ye, wilo ye…”
Dimdim jî devê xwe xistibû guhê wî û digot:
”Heyran hinekî giran be, tu ê hîna pir nivîsên wilo bibînî, wey.”
Li vî xirbeyê ku bi hişkeberê lê bûbû û wek xwaringehê bi kar dihat, her tişt bi haweyekî bû; her tiştê ku çavên mirov pê diketin, hizreke kûr û dûr bi mirov re çêdikir û gelek tişt bi hev re di bîra mirov de dianîn. Li ser her kevirekî dîwarên xirbe sûretek û nivîsek hebû. Sûretan hêsîriya xelkê kohî, rengê jiyana Serok Altaxus û girtin û kujtina şêrgeleyan û piraniya nivîsan jî tarîxa bûyeran destnîşan dikirin. Tarîx jî hemû ji sala 1952an û vir ve bûn.
Li hindurê vî xirbeyê sergirtî asas a ku Çolo ecêbmayî hiştibû û devê wî hata bi pişta guhên wî biribû, peykerê Serok Altaxus bû! Peykerê ku bi qasî qubeyekê mezin dihat û di nîvê xirbe de hatibû bi cihkirin, di çavên wî de bi ruh bûbû. Serok Altaxus li bakurê Kohistanê dinerî û bi haweyê

ku di şer de bû û ji çekdaran re digot ”ha wa ye ha dijminê we, de êrîş bikin ser”, destê xwe ê rastê tam radabû. Şêrgele jî li dora wî bûbûn zerazeng, hemiyan serê xwe berdabûn ber xwe, ziq li erdê dinerîn, pê bi pê diçûn û bi dorê destê wî maçî dikirin. Dor gihabû Çolo û Çolo hîn jî tê negihabû ku ê li pêşberî wî peyker bû. Li şensê wî ku Dimdim li pişt sekinîbû. Mêrik çawa ku giha ber peyker, lerizî û kabokên wî fisiyan. Dimdim jî hema ew ji newqê ve zeft kir û bi xwe re hilanî.

Şêrgeleyên ku ji bo şîvê derbasî xirbe bûbûn, piştî ku yek bi yek hemiyan senem tewaf kirin û li wê navê çar çar sef girtin, bi dengê şêrgeleyê ku got ”qerwaneee!” hema ketin temenê û mîna guran li devê derî nerîn. Bi hemû haweyî ji wan diherikî ku çiqasî li ber xwarinê ketibûn, ji nêza hilma genî ji devê wan diçû.

Qerwane hat, lê qerwane bermîl bûn. Savar di bermîlekê û nîsk di bermîlekê de bû. Bi dû bermîlkêşan de pênc kesan jî rahiştibûn sê bîdonên avê, telîsek nan û du tûr pîvaz. Di wê navê re jî deh kesekî bi yek tûşê re sê şemedanên pînekirî li erdê raxistin û yekser dest bi belavkirina xwarinê kirin. Piştî ku xwarin li ser erda zixurkirî rast kirin û her kes di cihê xwe de çik sekinî, yekî li pêpîkê xist û qêriya:

”Minnettarîîî!”

Şêrgeleyan:

”Em minnettarên te ne, ey Serok!”

”Kê ev nameta mezin da me?”

”Serok!“

72
”Kê ji me re ev rojên xweş û geş û serbilind pêk anîn?“
”Serok!“
”Dueya xwarinê qediya, bixwin!“
Piştî ku ên din jî gotin ”bijî Serok Serok Altaxus“, nehişî
kişiyan ser şîvê û bi kulman dawişandin pîvazan.
Dengê reqereq û gurmegurma kulmên ku li pîvazan
didan, di ser serê akademiyê re derdiket.
Şêrgeleyên ku di temamê karên xwe de destsivik bûn û
heta karê rojekê di seetekê de diqedandin, di ser xwarinê de
jî wilo destsivik bûn. Di ser şîvê de hîn çarîkeke wan neqediyabû
û dîsa deng bi wê pêpîka berî niha ket. Bi dengê
pêpîkê re her kesî her tişt di cih de hişt, hema rabû ser xwe
û berê xwe da xirbeyê di tenişt xirbeyê şîvê de.
Çolo ziqitand Dimdim û bi dizî jê pirsî:
”Niha em diçin ku?“
”Em diçin Akademiya Ilim û Edebê“
”Îcar çi karê min li akademiyên ilim û edeb û medeban
heye, ez ê bêm çi?“
”Ji xwe ji her kesî bêhtir karê te li wir heye. Bi qasî ku
ilim û edeb ji te re lazim e wilo ji tu kesî re ne lazim e.
Qut bike û xwe ji min bernede.“
Ev xirbe ji xirbeyê din hinekî cihê bû. Li hindur bi qasî
du sed-sê sed kursiyên piçûk û bê piştek, deh-deh di ber
hev re hatibûn danîn. Li pêşberî kursiyan li ber dîwêr televizyoneke
mezin li ser maseyeke piçûk bû û li pişt televizyonê
jî bi dîwêr ve ala partiyê daliqandî bû. Peykerê Serok
Altaxus di navbera alê û televizyonê de ji newqê û berjor

de li ser dikekê bû. Dika ku ji kevirên mermerî bi qasî gaze-
73
kê ji erdê bilind û du-sê gazan jî fireh dihat, bi temtêleke
delal hatibû lêkirin. Ev peykerê Serok Altaxus jî baş mezin
bû. Peyker ji zîv bû. Ji dawiya xirbe, televizyon tam diket
xavika zikê peyker û simbêlên Serok Altaxus mîna tîrêjên
rokê bi ser televizyonê de dikişiyan xwarê.
Şêrgele bi lez û bez derbasî hindurê Akademiya Ilim û
Edebê bûn û bêhis û pis heryek li ber kursiyekî di temeneyê
de sekinî. Çend bêhnik neketin wê navê, dîsa deng bi
wê pêpîkê ket û şêrgeleyeke hivdeh-hijdeh salî qêriya:
”Ilim?“
”Behra ilim, Serok e!“
”Edeb?“
”Edebnasê herî mezin Serok e!“
Şêrgeleyê, vê carê jî piştî ku bi zirt got ”rûnin!“ televizyon
bi dengê herî bilind vekir û ew bi xwe rûnenişt.
Bi vekirina televizyonê re çawa ku Serok Altaxus xuya
kir, mîna ku dinya biheje xirepiş û guregur bi her derê
xirbe ket; hemû bi carekê ve rabûn ser pêyan û di ber dengê
çepik û kilîliyan re pênc-şeş dengan li ser hev ”Bijî Serok
Altaxus, her bijî Serok Altaxus, tim bijî Serok Altaxus!“
gotin û rûniştin.
Lêbelê Çolo ne rûnişt û ne jî qut kir. Şêrgeleyê dengê
xwe lê rakir:
”Heval, temam, qediya, rûne!“
Çolo dengê wê nebir xwe. Heger Dimdim pê ve ranebaya,
destê xwe dananîba ser devê wî û ew wek lepek hevîr

bi kursiyê ve nezeliqandibaya, şêrgeleyê ji sedî sed wê ew jî dabaya Mehkemeya Edebê. Vê gelek kesên mîna wî dabûn
74
mehkemeyê.
Êvar tarî bûbû û hindurê xirbe jî bi qasî ku mirov hev nas nekiribaya reş bûbû. Lêbelê gava ku Serok Altaxus tam diket ekrana televizyonê, destê xwe ji şêrgeleyan re dihejand û dikeniya, televizyon dibû wek luksekê û heta bi qorzîbirên xirbe jî di nava ronahiyê de diman. Ji sahwa ku qudreta wî dida, dilopên xwêhdanê ha ha ji canê Çolo dinisilîn.
Ji her kesî bêhtir wî bala xwe dabû ser xeberdana Serok Altaxus û şêla wî. Û qet jî jê fêhm nedikir bê çi digot. Li gora wî Serok Altaxus derya ilim bû, tiştekî zêde zêde kûr dipeyivî û ehmeqekî wek wî jî wê di xeberdanên wî de negihabaya. Xwe wilo haş kiribû. Dema ku Serok Altaxus digot ”Skenderê Zilqerneyn bedena xwe objektîv pêşkêşî Aristo Teles kiribû û Anştay jî subjektîv insan teqandin“, wî jî di ber xwe de digot ”heh bê çi fîlozf e, bê çi pêxember e!...“
Îcar gava ku Serok Altaxus got ”di eslê xwe de hêka mirîşkê ne sipî ye, reş e. Ferud ji navikê û berjêr de difikirî. Ehmeqino, eskerên hoviyan Kohistanê dişewitînin. Di eslê xwe de dîk mirîşk e û mirîşk jî dîk e. Lê hûn ker in, hûn çi ji min fêhm dikin”, Çolo rabû ser xwe û bi dengekî bilind got ”wilo ye ya Serokê min, wilo ye! Gotinên te hemû ji Quranê ne!...”
Dimdim zû pê ve giha, ew bi kursiyê re kir yek û di guhê wî de got:

”Kuro lawo hinekî zilam be, te ez jî bi xwe re lewitandim
û hetikandim!”
Gotina Dimdim li hesabê wî nehat, li çep û rastê xwe
75
nerî, xwêziya xwe daqurtand û bi hêrs got:
“Helbet ez zilam mim; ez zilamekî wilo me ku ez her
şev dikarim sê carî bikim!”
Dimdim xwe jê aciztir kir:
“Temam qut bike!”
Qut kir. Lê piştî ku Serok Altaxus got “ker girs e, gur
hûr e û em insan jî gêrik in”, dîsa dest pê kir:
“Pa heyran wilehilezîm Serok pir kûr dipeyive, ez fêhm
nakim. Ker girs e, gur hûr e û em insan jî gêrik in, tê çi
maneyê?”
Dimdim:
”Hişşş”, got û engûşkek li xavika zikê wî xist.
Çolo ji pirsa xwe nehat xwarê:
“Pa…”
Dimdim nehişt ku a bi dû “pa” de bibêje.
”Gava ku Serok dipeyive mirov napeyive. Ew yeka han
dibe bêedebî. Û li vir jî cezeyê bêedebiyê pir giran e. Heger
hevalên ku ji dûr ve çavdêriyê li me hemiyan dikin, me
bibînin wê me herduyan jî bêerz bikin. Bitebite!”
Di wê navê re jî Serok Altaxus tam lê germ bûbû; digel
dest û pê û serê xwe, temamê gewdeyê xwe jî di xeberdanan
de bi kar anîbû. Mijara ku insan çawa ji êgir afirî bû
qedandibû, derbasî avê bûbû û digot:
”Di çavên insên de baran mîna ku bi rastî ji ezmên

dibare, ha! Ez ê devê Emerîkayê biçirînim! Kêzik dibîne û
insan jî dipeyive. Freud ji wir pê ve li tiştekî din nedifikirî.
Ehmeq, kûçik, hi ihi! Hûn hemû beredayî ne …”
Agir ketibû Çolo. Vê carê jî di ber xwe de, bi haweyê
76
ku ji Dimdim re bibêje ji xwe re got:
”Pa ev tên çi maneyê?”
”Hişşş, tên maneya hemû tiştên herî baş; wilo fêhm bike
û hew!”
Serok Altaxus gihabû beşê bêerzkirinê û bi qîjewîj digot:
”Ez bi derewan qirika xwe ji van kerên çolê re diqelişînim.
Hemû jî ji sikakan hatine, helbet ew ê ji min fêhm
nekin. Bav û kalên wan jî wilo ker bûn…”
Tiliyên xwe di herdu qulikên bêvila xwe de badidan,
bêvil bi destmaleke mezin paqij dikir û destmal li ser ruyê
xwe digerand. Tifî derdorê dikir. Çep û rast bi simbêlê xwe
digirt û dikişand. Bin çengên xwe dixwirand. Geh defa
sênga xwe, geh herdu xavikên kêlekan û berzikê xwe difirkandin.
Fanêreyê sertaziyê xwe bilind dikir, zikê xwe berdida
derve, tiliya xwe tam dixist hindurê navika xwe û digot:
”Freud bêexlaq e!...”
Aha tam di vir de Çolo dîsa berê xwe da Dimdim û bi
gotinên lewitî Freud da ber hev:
”Xuya ye ku vî bêbavê Freud Serok pir êşandî ye. Hek,
ev kî ye, ji ku ye û li ku ye? Ez ê wî kujim. Pa ez ê di patikê
bin serê bavê wî!...”
Dimdim hişk bi gurçika çîmê wî ê rastê girt û bi ser hev
de guvaşt:

”Miheqeq niha hevalan ew kujtiye. Bes e, karibe bi xwe
û nepeyive!..”
Perwerdeya Serok Altaxus a bi rêya vîdyoyê piştî ku
qederê seetekê dom kir, şêrgeleyekê televizyon girt û hema
pê re li pêpîkê xist. Dû re jî got ”kitêba edebê!” û çarhawêr
77
ampûl pêketin.
Bi pêketina ampûlan re bîst-sih şêrgeleyî xwe dadan kêşa
kitêbên ku li wê navê bi qasî qamekê ji erdê bilind bûbû û
di hilm û pifekê de kitêb li temamê şêrgeleyan belav kirin.
Kitêbek jî dabûn destê Çolo û hoviya Çolo jî bi haweyê tîp,
kît û berkîtan bû. Wî jî mîna hemiyan ev kitêba ku ji
nozdeh rûpelan pêk hatibû, danîbû ser çongên xwe û temamê
awira xwe berdabû ser bergê wê; li sûretê Serok Altaxus
dinerî û navê kitêbê dixwend.
”Dîtina Serok hêsan e lê fêhmkirina wî zor e!”
Bergê çep û rastê kitêbê xwerû sor bû. Lêbelê sûretê
Serok Altaxus sipî bû. Sûretê wî li ser herdu hêlan jî hebû.
Çolo navê nivîskarê vê kitêba ku ”Heval X” bû rast dixwend,
lê wî digot qey nivîskarê wê Serok Altaxus e. Heval
X li Ewrupayê wek ”profesorê kultur û edeba kurdî” dihat
naskirin û di zanîngeha televizyona partiyê de derza zimên,
kultur û edebê dida xelkê.
Çolo dîsa li Dimdim bûbû bar. Rûpelê pêşî vekiribû û
di rêza duduyan de asê mabû.
”Ez nizanim bixwînim, hinekî jî bi min dakeve gidî! A
hema vê hevokê ji min re şerh bike.”
Hevok giran bû û Dimdim jî jê fêhm nedikir.

”Ez çi zanim bê jeopolitîka ku di terka globalîzma cihanî
de Serok Altaxus daye ber xwe çî ye? Miheqeq tiştekî pir
baş e, wilo fêhm bike, derbas be û hew.”
Çolo wilo kir. Lê hîn bêhnikek-dudu neketibûn wê
navê vê carê jî got:
”Serok Altaxus, ne bi tenê hîmdarê insaniyeta miletê
78
koh e, ew di heman wextê de, bi sentez û antî tezên xwe
ên pêşker, ravêjê insaniyeta temamê dinyayê ye jî. Dimdim,
pa bi telaq min tiştek fêhm nekir. De ka hema piçekî ji min
re bibêje gidî!”
Dimdim bêyî ku xwe zivêr bike, kemlan pê re peyivî:
”Heyran, wileh ne ez û ne jî kesek ji van ên li vir, tiştekî
ji vê kitêbê fêhm dikin. Min gelekî xwe lê ceriband ku
ez hîn bibim. Lêbelê nebû û min li ser gotina alimên partiyê,
her peyveke kitêbê wek peyvên ji Quranê qebûl kir.
Ma tu ji Quranê fêhm dikî?”
”Na!”
”Ê ev jî Quran e, wilo bibîne û xwe ji vê êşkenceyê xelas
bike, weh!”
Gotina wî tam di serê wî de rûnişt. Çolo êdî nema jê
pirsî û bi wî zimanê hoviya xwe a sikakê li ber xwe da.
Di vê perwerdeyê de jî bêhnvedan tune bû û ji bilî çûna
tuwaletê, daxwaz û xwestin û bikaranîna her tiştî jî qedexe
bû. Neh-deh şêrgeleyên keç û xort bêwestan li pêşberî perwerdekaran
diçûn û dihatin û ji serê wan pê ve li tiştekî din
nedinerîn. Di wê navê re dema ku hin dipeyivîn û daxwaza
hin tiştan dikirin, ev keç û xortên nehtor hema bi wan

ve dizeliqîn û ew di cih de bêdeng dikirin. Piraniya kesên ku rê li ber wê bêdisiplîniyê vedikirin jî ên mîna Çolo nuhatî bûn.
Piştî ku perwerdeya edebê jî li derdora seetekê ajot, dîsa deng bi wê pêpîke ket, her kesî devê kitêba xwe girt û kitêb dirêjî destên keç û xortên ku nehtorî li wan dikirin. Bi dû danheva kitêban de vê carê jî jineke pêncî salî qêriya:
79
”Dewreee!” got û ji her derê xirbe bi sedan ampûlên piçûk û mezin pêketin. Bi pêketina ampûlan re Çolo veciniqî û di cihê xwe de lerizî. Dimdim zû pê ve giha, xwe xist bin çengê wî û jê re got:
”Li vir tiştekî ku mirov jê xof bigre tuneye.”
”Îcar çî ye?”
”Îcar jî dora ku em ê li sûretên bi dîwaran ve binerin û nivîsan bixwînin”, got û berê wî da nivîsa ku bi dîwarê pêşberî wan vebû.
”Bimre hebûn!
Bijî nebûn!
Bimre zanahî!
Bijî nezanî!
Çolo ”wilo çilo ye?“ got.
Dimdim guh li ”wilo“ û ”çilo“ya wî nekir, berê wî xist dîwarê ku diket paş wan û jê re got ”de ka van herçend rêzan bixwîne.“
Ev slogana han jî wek ên din bi tîpên mezin hatibû nivîsandin.
”Nepeyive, lêbelê ku tu peyivî jî li ser qudreta Serok bipeyive!

Bikuje, lê ku te nekujt jî seqet bike!
Efû neke, lê ku te efû kir jî pîs bike!”
Dimdim nehişt ku ew nerîna xwe a di derbarê sloganan
de bibêje û hema berê wî da dîwarê hêla bakur.
”Zanahî qelsî ye!
Nezanî xurtî ye!”
Çolo çawa ku got ”rast e, wilo ye“, Dimdim hema berê
80
wî da dîwarê ku peykerê Serok Altaxus pê vebû.
”Ez nizanim Serok dizane!
Ez nabînim Serok dibîne!
Ez netiştek im Serok her tişt e!”
Çolo piştî ku got ”sedeq ji vê gotinê re“, herdu çavên
xwe firkandin û ji cihê ku lê sekinîbû dewam kir:
”Pir rast e, em netiştek in; heger em tiştek bana ji xwe
hetanî roja îro em ê tiştek bana.“
Dimdim vê carê jî hişk bi çena wî girt û serê wî bi jor
de rakir. Jor bin zikê akademiyê bû û sûretê Serok Altaxus
û sloganên herî mezin jî bi wir vebûn.
”Tu derewîn dibî, tu solalês dibî, tu bêbext dibî,
tu çi dibî bibe lê girêdayê Serok Altaxus be!”
”Bijî Serok!
Dîsa bijî Serok!
Her tim bijî Serok!“
Çolo piştî ku tibabekî xwend, li hevpeyvîna ku şêrgeleyan
bi hev re kiribûn asê bû û alîkarî ji Dimdim xwest.
Dimdim jî nemerdî nexistê û bi dilekî rihet beşekî hevpeyvînê
jê re xwend:

- Heval, ji bo ku tu baweriya Serok bi xwe bînî te çi kiriye?
- Min tam sih û heft rojan xwarin nexwariye.
- Lêbelê heval, min çar rojan av venexwariye û pêncî û pênc rojan jî xwarin nexwariye.
- Heval, gelo tu dizanî ku mirov çiqasî xwe ji Serok re deyne û di kovar û rojnameyên partiyê de li ser xwe binivîsîne û xwe piçûk bike, mirov jî wê ewqasî mezin bibe?
81
- Ma çawa ez nizanim, heval! Ez her roj axa bin sola Serok maçî dikim.
- Heval, te çend hevalên ku di nav partiyê de xayin û ajan bûn kujtin?
- Heval, min hetanî niha 39 ajanên ku bi salan di nav partiyê de bûn û qaşo bi eskerên hoviyan re şer dikirin, kujtin.
- Heval gelo tu dizanî ku bi mirina Serok re dawiya dinyayê tê?
- Ma çawa ez niaznim, heval!
- Eman eman, ruhê min di ber ê cenabê wî keve!
- Milyar carî jî ê min, heval!
Hevpeyvîn li hesabê Dimdim nehat û dengê xwe birî. Dimdimê ku cara pêşî bû bi vî rengî nivîsên akademiyê dixwendin, ruyê xwe tirş kir û bêyî ku tiştekî bibêje serê xwe berda ber xwe.
Li vê akademiya ku dişibiya mêşdanên çoliyan, ji sûretên Serok Altaxus pirtir tiştek tune bû. Ji binê akademiyê û hetanî ku digiha bin zikê akademiyê bi her derê ve hawe

bi hawe sûretên wî hebûn. Sûretên şêrgeleyên kujtî jî pir bûn, lê ne bi qasî ên Serok Altaxus.
Di xwendina dewreyan de xeberdan serbest û xirecir jî qedexe bû. Şêrgeleyan bêyî ku temeneya xwe xerab kiribana û ji vir gazî ê li wir kiribana, dikarîbûn di derbarê sûret û nivîsan de bi hev re bipeyivyana. Bi vê serbestiyê ji her kesî bêhtir kêfa Çolo hatibû. Mêrik xwe dabû tengala Dimdim û bi kêf û eşq ha ha jê dipirsî:
”Zindî ne tiştek in, kujtî her tişt in! Ev tê çi maneyê?”
82
“Tê maneya ku divê mirov zû xwe di ber doza miletê xwe de bide kujtin. Welat bi kujtiyan heye.”
”Rast e, rast e, wilo ye, wilo ye…”
Çolo mîna sofiyê ku bi tena serê xwe li mizgefta Xerêb di tewacê de bi sur ketibû, bi “hayellahê” dabû naftarên gund û li her tiştê ku bi çavên wî diket ha ha dizikirand.
”Ji Xwedê tê veşartin lê ji Serok nayê veşartin!”
Serê xwe dihejand, li sênga xwe dixist û digot:
“Sedeq ji cenabê te re! Ma ji şêx û mişaxiyan tê veşartin ku heta ji cenabê te jî bê veşartin!”
Bi deng disediqand û dengê bilind jî qedexe bû. Dimdim ziqitandê:
“Heyran wilo nabe, hêdî hêdî.”
“Li min negire, daye nava min!”
Çolo bala gelek şêrgeleyan kişandibû ser xwe û ew yeka han jî hişê şêrgeleyên ku dewrê xwe dixwendin têk dibir.
Di dawiyê de Mulayim Hemê ku berpirsyarê exlaqê wê derê bû xwe gihandê û bi zirt jê re got:

”Heval, vira ne mizgeft e, bêexlaqiyê meke!”
Li şensê Çolo ku dawî li dewreyan hatibû, pêpîka razanê lêxistibû û nûnerê exlêq Mutewazî Osê jî berî her kesî çûbû razanxaneyê. Mulayim Hemê mûyekî jê hûrtir bû û xwedî desthilatiyeke bêsînor bû. Çolo Serok Altaxus di rengê şêxan de bi bîr anîbû û Serok Altaxus piçûk xistibû. Berpirsyêr dev û bêvila gelek şêrgeleyan li wir pelixandibû û nûner jî çendek kujtibûn.
83
Dema ku herheft şêrgeleyên nobedar bi hev re li pêpîkan xistin, seet tam pêncê sibehê bû û çavên Çolo jî nuh çûbûn ser hev. Lê digel wî haweyî jî ew berî her kesî ji xewê hilqevizî, li qûn rûnişt û mîna dînan li derdora xwe nerî. Dimdim di kêleka wî de servedayî xwe diveparimand, lê dinerî û dîsa jî ew nas nedikir. Da xwe ku rabe lêbelê kelax pê re ranebû. Laşê wî mîna rêsiyên herêma wî li hev geriyabû. Ji rêyeke dûr û bi teq û req hatibû û bi ser de jî qet xew bi çavên wî nebûbû. Şeva xwe bi carekê ve bi edeba xwe a ku wê derketa meqamê Serok Altaxus re bihirandibû. Li gotinên herî xweş û têgehên mezin geriyabû û yek jî peyde nekiribû. Xwe dabû ber vê sêncê, çûbû ber wî dîwarî, daketibû ber wî kendalî û li dan û stendina kesên ji xwe zanatir temaşe kiribû. Li civata maqûl û axayên têriyan rûniştibû. Hişê xwe berdabû ser tevgera melayên mintehî. Ilmê xwe ê tûrik tevdabû û dîsa jî tiştekî ku wê di hizûra Serok Altaxus de bi kêrî edeba wî hatibaya bi dest nexistibû. Li ser çarlepikan derketa pêşberî wî derdek û li ser pêyan çûbaya derdekî din bû. Di zimanê kohî de navê herî

mezin mîr û mîrekî bû û Serok Altaxus jî li ba wî ji mîr û mîrekên temamê dinyayê mezintir bû. Li padîşahiyê pir fikirîbû, lê di dawiyê de ew jî neketibû serê wî. Nîvê şeva xwe bi şahînşahiyê re derbas kiribû û dev ji wê jî berdabû. Li navê Xwedê û pêxemberan kûr bûbû û hûr bûbû û hênijîbû. Li vê razanxaneya ku navê wê ”Koşkxane” bû, şêrgeleyan zû xwe dan ser hev û çengî derve bûn. Ji xwe tiştekî ku pê daketibana jî tune bû. Her kes girêdayî raza bû. Û seran-

84

serî razanxaneyê jî bi sê doşekên ku ji pûş û pelaxê dagirtî bûn, seraqet li erdê raxistîbûn. Tiştê ku divabû bidana ser hev bi tenê hew betanî bûn û ew jî hemû karê hilm û pifekê bû.

Çolo berî her kesî xwe pev xistibû û li wê navê çit sekinîbû; bi çavekî nivîsa ku bi dîwêr vebû dixwend û bi çavê din jî li Dimdim temaşe dikir.

”Pêşî bi şik li dirustiya xwe û dû re jî li a hevalê xwe binere!”

Serok Altaxus

Dimdim jî mîna ku qet hayê wî jê tune bû li ser cihê xwe sistûpistî diqelqilî û bêdilî xwe bi şêrgeleyan re dipeyivî. Ew jî ranezabû. Lêbelê a wî ne ji kêfan, ji qehr û merezê bû. Li gora wî Keleha Mezlûman navenda şoreşê bû û li wê navendê jî her tişt di rengê xerabiyê de li hev diqulipî. Di hatina xwe a vê carê de ji nêzîk ve gelek aliyên şoreşê dîtibûn û ji şoreşê tirsiyabû; li her tiştî bi şik nerîbû û tiştan jî baweriyên wî yek bi yek fik kiribûn. Sahwê girtibû hinavên wî û şefa xwe bi ax û keseran derbas kiribû.

Dimdim piştî ku Çolo li razanxaneyê da rûniştandin û
bi lez û bez ji razanxaneyê derket, nîv seetek neket wê navê,
bi nûnerê terbiyê re li Çolo vegeriya û ji Çolo re got:
”Karê min hata bi vir bû. Êdî ez niha te teslîmî nûnerê
terbiyê Mumtaz Remê dikim û ez li cihê ku jê hatibûm
vedigerim. Û bi xatirê we.”
85
Bi çûna Dimdim re Çolo xwe hîn bêhtir nêzîkî Serok
Altaxus dît û ji kelecanê hinavên wî mîna pêlên behran di
ser hev re qulipîn. Heger nûnerê ku di heman demê de wek
îdeologê terbiya partiyê jî dihat naskirin û hema jê û wir
de bi terbiya keçekê daketibû, ew li ber bermîla çopê nedaba
rûniştandin, Çolo wê xwe li ser pêyan negirtibaya.
Nûnerê terbiyê piştî ku bi zirt û pirtan û tifkirinê baş erza
keçikê şikenand û keçikê jî qet dengê xwe nekir, bi hêrs li
Çolo vegeriya, serpozika qundera xwe bi haweyê ku wî bi
xwe re bibe li çîmê wî da û meşiya. Çolo fêhm nekir.
Nûner vê carê jî lê zîvirî û bi herdu destan jê re li camcamkan
xist. Çolo fêhm kir û mîna tajiyekî ber pê de çeng bû.
Niha êdî berê wî ketibû meqamê Serok Altaxus; piştî
çend bêhnikên din wê gihaba wir û ji devê deriyê meqêm
heta bi ber lingên Serok Altaxus wê bi zikişkê çûbaya.
Mêrik wilo difikirî, ji kêfan re mîna bergîla têrcehî ha ha
ba ji ber diçû û nûnerê ku bi şev û rojê derza terbiyê dida
şêrgeleyan jî berê wî dabû dezgehên şoreşê.
Bi rê de Çolo xwe negirt:
”Heval, Serokê me û temamê dinyayê”, got û Mumtaz
Remê jî hema pê re kulmek dawişand devê wî.

Çolo cefilî, xwe bi paş de vekişand û vê carê jî got:
”Weh weh, heval, heval!...”
Remê piştî ku hinekî lê nerî, hişê xwe baş berda ser terbiya
wî û terbiye neeciband, çend şiqamên çivir pê ve zeliqandin,
bi pêxêla wî girt, hejand û hejand û bi zirt û pirt
jê re got:
”Bêterbiye, mirov li himberî îdeologan wek te nake!
86
Gava ku te xwest tu bi min re bipeyivî pêşî destê xwe bilind
bike.”
Çolo ji tirsan reşxeriqî û bêhemdî xwe got:
”Heval!”
Remê qêriya:
”Pêşî destê xwe bilind bike”, got û pehînek li defa sênga
wî xist.
Çolo bi pehîna wî re di nav heriyê de veziliya. Ew hîn
di wê rewşê de bû, Remê kişiya ser û çend pehînên din li
termaza wî xistin. Çolo destê xwe hilda, lê fêde nekir. Remê
destûra xeberdanê nedayê, bi qehr “bide dû min”, got û
rehwankî meşiya.
Dezgehên şoreşê ji wan û hema bi wir de bûn û bi xof
xuyanî dikirin. Çirûsk û rivînên agirê ku ji wan diçûn,
dengê sîlehan û carecar û hewar hewara jin û mêran di felekan
re derdiketin. Kûçik jî direyan. Di eslê xwe de asas a
ku Çolo ji desthilanîn xistibû, ew bûn. Heger Remê ew rast
biribaya beşê êşkenceyê û kujtinê, ji sedî sed wê Çoloyê ku
şeqlovizkî bi rê ve diçû ji qiram ketibaya û heta belkî dilê
wî jî sekinîbaya. Lêbelê Remê ew biribû beşê aşxaneyê. Û

li wir jî pazdeh-şazdeh şêregeleyên bêrih û bêsimbêl û serzelût tenûr dadabûn û haziriya xwe û nanpêjanê dikirin. Li vir bêhna Çolo hinekî hat ber. Lêbelê wê bêhnvedanê qey kêlîkekê-duduyan ajot û Remê berê wî da deriyê ku ji hewşa aşxaneyê diçû hewşa din.

Bi vekirina derî re devê Çolo bihustekê vebû, rimekê bilind bû û mîna pelê çilo ha ha ricifî. Remê zû lê hayî bû; ew ji newqê ve hişk zeft kir û di serê rêza herî nêzîkî xwe

87

de da rûniştandin.

Vir hewşa Edaleta Şoreşê bû; temamê şêrgeleyên li Keleha Mezlûman li vir civiyabûn, sef bi sef li ser beşt û mircaqan rûniştîbûn û bêhis û pis li Mehkemeya Şoreşê, girtiyên wê û sûretên Serok Altaxus temaşe dikirin. Sûretên Serok Altaxus bi her derê dîwaran ve bûn. Sûretên wî ji hejmara şêrgeleyên rûniştî pir zêdetir bûn.

Li vê mehkemeya ku girtî geh bi demaçeyan, geh bi kêr û xinceran û geh jî bi dardekirinê dihatin kujtin, di rengê kohî de tiştekî jî xuya nedikir. Her derê mehkemeyê bi motîvên sosyalîzma rûsî û tiştik û miştikê Serok Altaxus xemilandîbû. Mehkeme ji yazdeh kesan pêk hatibû. Seroka wê yeke qut e girover, kulfisî û navser bû û ên din jî hemû hivdeh-hîjdeh û nozdeh salî bûn. Endamên mehkemeyê şeş jê keç û çar jê xort bûn. Girtî jî ji bilî du keç û sê xortên ku hatibûn kujtin, duwazdeh xort û heşt keç bûn. Destên wan ji paş ve girêdayî bûn û li ser pêyan ziq li mehkemeyê dinerîn. Hemiyan jî hîn bîst sal nekiribûn.

”Welato û Gulçînê”, seroka mehkemeyê Sevgî Hanim

got û dewam kir:
“We xwestiye ku hûn hevdu maçî bikin, lê hûn pê re negihane; çavdêrên edeb û exlêq di ber we re derketine û kiryara we nêvcî maye. Îcar maçîkirina di rengê a we de jî sekseke subjektîv e. Seks dijminê Serok Altaxus û şoreşê ê herî mezin e. Seks maka bêexlaqiyê ye, bêexlaqî ajantî û ajantî jî qesda kujtina Serok Altaxus bi xwe ye. Wilo ye yan na?”
Herduyan bi hev re gotin:
88
”Wilo ye, heval!”
Sevgî:
”Îdeologên partiyê rojê sê seetan li ser ku seks mirov çiqasî bêexlaq dike derz dane we jî yan na?”
”Derz dane me, heval.”
“Gotina we a dawî çî ye?”
Gulçînê giriya û tene tene got:
“Em herdu pir ji hev hez dikin. Me cahiliyek kir û em ê tu carî nema wê cahiliyê bikin. Me bibexişînin.”
Sevgî piştî ku destê xwe ber bi Welato de dirêj kir û Welato jî wek Gulçînê got, di cih de biryara xwe da:
“Mehkemeya Şoreşê bi delîlên xwe ên diyar û nediyar, bidestxistina gelek nameyên xefî û şahidên xwe ên veşirtî û lixwemikurhatina herdu bêexlaqan, gihaye wê baweriyê ku bêexlaq, sergirtî derbasî xeleka servekirî bûne û pê li qudreta cenabê Serok Altaxus û temamê miqedesatên şoreşê kirine. Îcar li gora qanûna sosyalîzma hevdemîn benda 125an ku yekser cenabê Serok Altaxus û miqedesatên şoreşa

gundî û karker diparêze, sûcê van herdu rezîlan kujtine.
Û ez kujtina wan dixwazim!”
Bi gotina wê re temamê endamên mehkemeyê jî bi yek dengî kujtina wan pejirandin û du xwînrijên şêrgele hema ber bi wan de qedimîn. Herdu ji nav girtiyên din veqetandin û bêyî ku çavên wan girêbidin, ruyê wan xistin derba demaçeyan û li bendî emrê kujtinê sekinîn. Xwînrij di wê rewşê de wilo sekinîbûn û van herduyên din jî dest bi sloganan kirin:
“Bijî Serok Altaxus! Bi xwîn, bi can, bi ruh em bi te re
89
ne ey Serok”, gotin û seroka mehkemeyê dengê xwe hilda:
“Temam, êdî hûn dikarin wan bikujin!”
Herdu evîndar gihabûn slogana “tu roja me yî, ey…” û devê wan bi agirê ku ji devê demaçeyan pijiqî tije bû.
Welato berî Gulçînê li erdê ket û Gulçînê jî teniştkî bi ser de kumişî. Dema ku şêrgeleyên termkêş bi lingên wan girtin û bi dû xwe de kişkişandin, ji çavên Gulçînê hîn jî hêsir diherikîn.
Seroka mehkemeyê bi dû kujtina van herdu dildaran de, qederê bêhnekê çavên xwe li ser koma şêrgeleyên guhdar gerandin û bi qîjewîj got:
“Sîpano û Delalê, nobedaran hûn di hindurê tankêra avê de himbêzkirî dîtine. Û himbêzkirina keçekê û xortekî di cihekî ewqasî îlegal de jî sekseke objektîv e. Seksa bi haweyê a we, qehpitiyeke bêsînor û ajantiya herî mezin e! Qehpitî şoreşê pasîv dike. Û pasîvîzekirina şoreşê jî ajantî ye. Heval, hûn ajan in. Dewleta Hovistanê ji bo kujtina

Serok Altaxus û hilweşandina şoreşê hûn şandine vê keleha miqedes. Wilo ye yan na?”
Delalê devê xwe vekir, lê Sîpano berî wê peyivî:
“Wilo ye heval, lê em ne ajan in. Tankêra avê qul bûbû, tankêr ji avê zû vala dibû û di wan rojan de jî ji akademiyê re av pir lazim bû…”
Sevgî dengê xwe lê rakir, “zû biqedîne”, got û hişk destê xwe li maseyê xist.
Sîpano li îfadeya xwe lezand:
“Loqek benîştê Delalê hebû û bi benîşt jî ew qul asê dibû. Pêşî Delalê bi tena serê xwe çû ku qulê biseyîne, lê
90
heq jê derneket. Dû re em tev de çûn…”
Serokê dîsa erza wî şikenad û xwest ku hema gotina xwe biqedîne.
Sîpano jî wek wê kir, bi zirt got:
“Erê ha, heval! Em ketibûn hindurê tankerê, me herduyan bi hev re tam destê xwe danîbû ser qulê û hevalê nobedar ji me re li pêpîkê xist. Me tu qul mil asê nekirin û em hema derketin…”
Sîpano wê hîn bigota lê serokê nehişt û vê carê jî ji Delalê pirsî:
“Ma Sîpano rast dibêje yan derewan dike?”
Delalê bi dengekî nizim û rûyekî fedîkoyî bersiva wê da:
”Sîpano hemû rast got; erê wilo bû.”
Sevgî Hanim mîna ku Serok Altaxus li bendî wê bû, li hemû tiştî bi lez diçû. Piştî ku Delalê jî gotina xwe qedand, hema yekser rabû ser xwe û biryara xwe li ser pêyan da:

“Ez we ji benda 125an, ceze dikim!”
Lêbelê çawa ku wê wilo got, jineke bejinçinarî jî ji nav koma şêrgeleyên rûniştî rabû ser pêyan û bi qîrewîr got: “Bijî seks! Bimre Serok Altaxus û mehkemeya wî a ji rezîlên wek we! Qehp û qehpa herî mezin Serok Altaxus û seroka mehkemeyê ye! Serok Altaxus ajanê dewleta Hovistanê ye!...”
Vê navtengzirava jinan wê hîn pir gotibaya, lê dengê wê zû birîn. Ji vir û wir ve şêrgeleyên xwînrij û termkêş mîna gur û wawîkan kişiyan ser û kelaxê wê dan ber derbên kêr û xinceran. Kelax zîvar zîvarî kiribûn û hîn jî lê didan. Heger seroka mehkemeyê ew ne sekinandibana, kî dizane
91
belkî goştê wê jî mîna ê Şevger kiribana qitîtk qitîtk û biavêtana ser Moristana Şoreşê.
Piştî ku Sevgî Hanimê mehkemeya Sîpano û Delalê avêt rojeke din, Mumtaz Remê ziqitand Çolo, ew rakir, bi destê xwe ê rastê deriyê ku bi nivîs bû işaretî wî kir û ber bi derî de meşiya. Çolo jî di temeneyê de da dû û temamê awira xwe berda ser nivîsa ku di sênga derî de bi tîpên mezin “BEŞÊ HEDAYETÊ” hatibû nivîsandin. Navbera derî û cihê ku lê rûniştibûn sed metreyek hebû û Remê jî giran giran diçû. Lê piştî têgiha ku Çolo nivîs bi haweyê tîp û kîtan xwendibe jî êdî ji nivîsê fêhm kiriye, lezand û bi hilmekê re xwe gihand deriyê ku ji bal îdelogan ve xiliqandî bû. Remê li gelşa mifteyên li ser xwe zêde neawiqî, zû bi ser mifteyê vebû. Derî bi hêrs vekir û bêhnekê ziq li herdu çavên Çolo nerî. Dû re jî xwe çengî pişt kir, “bêşeref”, got

û bi pehîna xwe re ew pekand hindurê hewşê. Çolo yekser ji desthilanîn ket, mîna tevna pîrê li hev geriya û kelûgirî got:
“Heval, sûcê min çî ye?”
Remê bi ser de hilbû:
”Pêşî destê xwe bilind bike. Û dû re jî li bendî gotina min bisekine bê ka ez destûrê didim te yan na, bêterbiye”, got û pehîneke din pê ve zeliqand.
Di wê navê re jî şêrgeleyekî ku ji çepilên xwe ve daliqandî bû ha ha gazî Çolo dikir:
”Heval, Remê ajan e, wî bikuje! Bijî Serok Altaxus!...”
Remê bêhnekê dev ji ê li erdê veketî berda û berê xwe da ê bi çengel ve daliqandî:
92
”Kamil Hesê, bêhna xwe fireh bike, hemû du seetek ji te re mane ku ez ê bi ser termê te de jî bimîzim…”
Kamil Hesê îdeologê perwerdeyê kesê nehan û Mumtaz Remê jî îdeologê kesê hivdehan bû. Îdelogên berî wan heryek bi destê ê ku li şûna ê din bûbû îdeolog hatibûn kujtin.
Çolo li erdê vezilandî destê xwe rakir. Remê jî piştî ku jê re got ”rabe ser xwe”, destûra xeberdanê dayê û bêyî ku lê guhdarî bike meşiya.
”Ez fêhm nakim bê tu çima van asaqan di min de dikî. Gelo min çi bêedebî li himberî te kiriye?”
Remê dengê wî nebir xwe, qelpaxa çala devgirtî hilda, xwe bi ser çalê de tewand û peyivî:
”Ev jî Hêtûna Şoreşê ye. Gelek ajanên mîna te di vê

hêtûnê de bûn xwelî.”
Bi vê gotinê qurpînî bi nava Çolo ket, çavên wî ên zerdoqî
çûn xwarê, zimanê wî şikest û lerizî; bi vir de û wir
de pekiya û dilopên mîzê ha ha xwe bi nav şeqan de berdan.
Kabokên wî jî fisiyabûn. Û heta ziktêrî ba belkî verşiyaba
û zikê wî jî çûbaya. Ew haweyê wî tiştekî zêde li
hesabê Mumtaz Remê hatibû. Mêrik terbiyezanekî ku di
karê xwe de ne bi ser ketîbû û Serok Altaxus jî li ser wê
yeka han çend carekî erza wî şikenandibû; bi dehan şêrgeleyên
ku li dijî terbiya wî sekinîbûn ji canê xwe bûbûn û
Çolo jî digel ku qet ji metodên terbiya wî fêhm nekiribû,
tam li gora terbiya wî tevgeriyabû. Çolo hîç nizanîbû ku
îdeologiyeke mezin li pêşiya wî bû û her şêrgeleyê ku bûba
îdeolog jî divabû di xindeqên dezgehên şoreşê re derbas
93
bûbana û Çolo jî di wan xindeqan de bi rêz û tertîp
meşiyabû. Remê hindik mabû ku ji kêfan bifiriya. Bi xeberên
çort ajotibû ser terbiyexwazê xwe û qederê du-sê deqîqeyan
bêwestan tif kiribûyê. Terbiyexwazê wî jî ne destê
xwe hildabû, ne peyivîbû û ne jî ruyê xwe jê gewirandibû.
Serê xwe ê bergîlî berdabû ber xwe û li himberî wî bêkip
sekinîbû. Êdî ji wir û pê ve qet pêwîst nedikir ku ew li
beşên Hedayetê gerandibaya. Çolo sadiqekî wilo bû ku li
ser gotina Serok Altaxus her tişt dikarîbû bikraya. Remê di
perwerdeya xwe de bi ser ketibû û bawerî pê anîbû ku di
vê carê de ji sedî sed wê ji Serok Altaxus sipasiyeke mezin
stendibaya; ji ber ku Serok Altaxus, Çolo bêderb û sadiqekî
tam terbiyekirî xwestibû meqamê xwe.

”Bide dû min ajanê pîs”, got û ber bi Zindana Şoreşê
de meşiya.
Çolo vacavaca û lewliqî da dû û bi çar çavan li zindanê
û girtiyên ku bi sloganan diqêriyan nerî.
Zindan bi mîmariyeke delal ji betonê û kevirên şehkirî
li ser du qatan ava bûbû. Ji der ve de mîna qesran û ji hindur
ve jî mîna xana keran xuya dikir.
Remê giha ber qulikên beşê hicreyan û girtiyan jî dengê
sloganên xwe ên yekrengî bilind kirin:
“Bijî Serok Altaxus! Bi can, bi xwîn, bi ruh em bi te re
ne ey Serok!...”
Bîst û neh girtiyên ku wek kadroyên partiyê bi nav
dibûn, di sê hicreyan de bûn û giş jî li ser dema ku Serok
Altaxus li akademiyê peyivîbû, kuxuya bûn û di xew re
çûbûn hatibûn girtin. Li gora dergevanê zindanê Melûl
94
Hesoyê ku ji pênc mehan carekê rapor dida îdeologên partiyê,
di nav wan girtiyan de ên ku ji salekê kêmtir raza bûn
sê keç û pênc xortên bajarî bûn û ew jî bi jana zirav ketibûn.
Mumtaz Remê piştî ku di ber hicreyên qulqulî re hêdî
bi hêdî derbas bû û bi wî rengî xwe gihand hindama
hicreyên kor, sekinî û qederê hilmekê bi ruyekî kirêt li
Çolo nerî. Dû re jî bi hêrs deriyê zindanê vekir û bi dengekî
bilind jê re got:
“Ji Serok Altaxus pê ve tu kes nikare ajantiyê ji ser te
rake û te bibexişîne”
Çolo vê carê tam ket hev, mîna dîkê ku bide nav moristanê
bi vir de û wir de hilqevizî û kelûgirî peyivî:

“Ez ne ajan im, ez sola bin lingê Serok im, ez…”
Remê nehişt ku zêde bike:
“Were bibîne da tu bizanibî dew birayê mêst e”, got û
pê ve beziya. Bi çepilê wî girt û mîna qerpalekî ew bi hindurê
zindanê de avêt.
Şingeşing bi deriyê zindanê ket û tîrêjên rokê kişiyan
hicreyên kor. Tevzînok bi canê Çolo ve hilkişiyan, gazekê
ji cihê xwe bilind bû û mîna xiltê ku bi ser qula xwe venedibû,
bi qûncikên hicreyê ve habela beziya. Derî vebû û
şêrgeleyek derbasî hindur bû. Dilê Çolo mîna lûlkê êş lê
xist û sêng zewirand. Êdî niha dor hatibû wî û di wê mehkemeya
doh de wê ew bidana ber guleyan û di heman
wextê de jî bi kêr û xinceran kişiyabana ser cendekê wî. Aha
bi xwe re wilo dipeyivî û şêrgeleyê pê ve danî:
95
”Çolo xwe bide ser hev!”
Ev dengê jinekê bû û wî jî jin bi serkulekê nedihesibandin.
Hinekî bêhna wî derket. Lê piştî ku seroka mehkemeyê
hat bîra wî, jin di çavên wî de bûn devçirên mêran,
dilopên mîzê jê niqutîn û heta ku jê hat qêriya:
”Eeeehew!”
Şêrgeleya ku şika dînitiyê jê kir, di ber xwe de bêdeng
beşişî:
”Heval, ev te aqilê xwe xwariye”, got û deriyê hicreyê
vekir.
Çolo jî çawa ku ew dît, mîna zîzokê çar hawêrê xwe li
ser betonê rûniştkî zîz bû û serqûşkî da nav:
”Ez ne ajan im, ez ne ajan im! Bijî Serok Altaxus,

Serok…!”
Şêrgeleyê jê dûr sekinî û kubar pê re peyivî:
”Helbet tu ne ajan î, tu bi dê û bav kohistanî û kezebkirê Serok î.”
Çolo sist bû û hinekî bi ser xwe ve hat. Lê piştî ku şêrgeleyê got ”de zû xwe kar bike, heval hemû li bendî te ne”, dîsa bû ew ê berî niha. Devê wî li hevgeriya û tewşikî da ber xwe:
”Ha ha, wax wax, Serok Altaxus, haho, Serok, bijî…”
Şêrgeleyê dengê xwe lê rakir:
”Qut bike! Berî ku Serok Altaxus bê Baregeha Şoreşê, divê em li baregehê bin”, got û bi destê wî girt.
Çoloyê ku bi van gotinan gavên wî hatin ber wî, destê xwe bi dest ê wê ve berda û hema rabû ser xwe. Şêrgeleyê jî geragup kir; li her tiştî lezand û bi yektûşê re ji zindanê
96
derketin.
Navbera vir û Baregeha Şoreşê bi meşa koçerekî pêncşeş deqîqeyek û bi meşa şêrgeleyekî jî du-sê deqîqe filan digirtin. Şergeha Şoreşê bi baregehê ve bû û asêgeha Serok Altaxus jî çend gavekî ji wan û bi wir de bû. Li baregehê bi hejmar 40 şêrgeleyên nuhatî di temeneyê de rêz girtibûn û hemû li bendî Serok Altaxus bêdeng sekinîbûn. Serok Altaxus ji heftê carekê û carina jî ji du hefteyan carekê dihat Keleha Mezlûman; li akademiyê qederê seetekê ders dida îdeolog û kadroyên partiyê û bi şêrgeleyên nuhatî re dipeyivî. Serok Altaxus li bajarê Çamê rûdinişt.
Şêrgeleyê piştî ku Çolo xist nav rêzê û li wê navê çitikî

sekinî, Nûnerê Disiplînê Helîm Xelê jî hema dest bi xeberdana xwe a her tim kir:
”Baş li min guhdarî bikin!
Dema ku Serok hat, hûn ê xwe tam bi ser hev de biguvêşin, ziq li ezmên binerin û mîna şiveke hesinî rast bisekinin. Wekî din sûc e. Kuxuk, xurandin û xeberdan qedexe ye. Hilma xwe hêdî bi hêdî berdin”, got û li xirepişa ku bi asêgehê ketibû nerî. Wî hîn wilo li wir bi çar çavan dinerî û ji nişkê ve şêrgeleyê ku bi keleşkovê ji rêzê çend gavekî dûr sekinîbû qêriya:
”Haydarîîî!”
Ev têgeh dihat maneya ku ”Serok Altaxus hat!” Wek vê gelek têgehên ku wan bi xwe çêkiribûn hebûn. Îcar piştî ku Serok Altaxus û koma şêrgeleyên pê re ji rêzê xuyanî kirin, Helîm Xelê dest pê kir:
”Pir haydarîîî!” got û çend şêrgeleyan bi hev re daweri-
97
qandin sloganan:
“Roja me ye heyva me
Şev û roj, demsala me
Bêhn û hilm û hewa me
Dil û can û ruhê me,
Serok e her tiştê me!“
Serok Altaxus bi gopal bû; gopalê xwe habela dihejand, bi ser komê de dikire birebir û bi lez dihat. Dengê wî gihabû heta bi Mehkemeya Şoreşê û her kes rabûbû ser pêyan. Serok Altaxus çawa ku hat gopalê xwe ê ji dara berû di sênga keça ku di serê rêzê de sekinîbû rakir û bi zirt jê re

got:
”Te dizanîbû ku ew Şefîqê bavê te ajan bû, ne?”
”Na, min nizanîbû Serokê min.”
Bersiva wê li hesabê wî nehat. Bi qehr gopalê xwe çend carekî li erdê xist, xwe bi ser de tewand dengê xwe hilda û bi qerf jê re got:
”Hi, îcar yanî niha bi rastî te nizanîbû ku bavê te mirovekî xwefiroş bû, ha?”
Deng ji jê nehat. Keçik diricifî. Wî pişta xwe rast kir û vê carê jî bi hêdîka destê xwe di ser serê wê re bir û anî:
”Berî ku tu hatibaya vir divabû te ew xayin safî kiribaya”, got û berê xwe da xortê di tenişt wê de. Bêhnekê lê nerî. Dû re bêyî ku xwe bitewîne sê caran li ser hev tifî erdê kir. Devê wî mezin bû, tifa wî gelek bû û ba jî dihat. Tif bi ser ruyê xortê ku mîna pepûkê xwe bi ser hev de qijilandibû belav bû û wî bi zirt jê re got:
”Qaşo ew bavê te ê rezîl, serokê Partiya Sosyalîstên Koh-
98
perweran bû (!) Wî ajanî em gelekî êşandin û min rojekê nebihîst ku te hema tifek jî tê werkiriye. Mirovên şoreşger pêşî ji mala xwe dest bi şoreşê dikin û dû re beşdarî nav refên şoreşgeran dibin. Ma ne wilo ye ehmeqo?”
Xortê ku zimanê xwe daqurtandibû û mîna pelê çilo diricifî, qet dengê xwe nekir. Serok Altaxus jî êdî dev jê berda, ber bi xortê ku di dorê de bû meşiya û li şêrgeleya ku defter vekirî bi dest xwe ve girtibû nerî. Şêrgeleyê jî hema xwe da kêleka wî û pê re bû yek. Serok Altaxus bi haweyê ku li dereke dûr nerî liviya û çavek li nivîsê gerand.

Dû re serê xwe berda ber xwe û hinekî ponijî. Dû re jî ji nişkê ve serê xwe rakir, gopalê xwe di sênga ê xort de rakir û qêriya:
”Tu, tu, tu, ha!”
Xortê ku nuh ji eskeriya hoviyan reviyabû û rast xwe li Keleha Mezlûman girtibû, Serok Altaxus di çavên xwe de mîna çawîşê qerwana tabûra xwe dît û li ser hev ha ha got:
”Qerwane amade ye komutanê min, amade ye komutanê min!”
Serok Altaxus tam ji ser xwe çû:
”Qerwane ha, qerwane, qerwane!” got û tif kir ser dev û ruyê wî. Dû re jî bi gopalê xwe ê ku xistibû defa sêngê, ew bi hêrs dehfand.
Lawik jî ket û xwe ji bîra kir ku raba ser xwe. Di dawiyê de Nûnerê Disiplînê pê ve beziya û bi lez û bez ew ji rêzê bi dûr xist.
Serok Altaxusê ku qet bêhna wî fireh nedibû, piştî ku bi dizî çavek avêt deftera di destê şêrgeleyê de, li ber Çolo
99
sekinî, gopalê xwe di sênga wî de rakir û serê xwe lê hejand:
”Çolo efendî!”
Çolo veciniqî û xwêhdana ku ji eniyê diherikî sekinî.
”De ka bibêje bê ez ê çawa baweriyê bi te bînim heta ku ez bikaribim te efû bikim?”
Xwîn lê vemirî.
”Li gora qanûnên partiyê cezeyê te bidardekirin e.”
Mîna zarokên ku li gasînên gund diketin tayê, şerqeşerq bi diranên wî ketin.

”Lê de ka ez binerim belkî ez şensekî bidim te.”
Ruyê wî wek gulekê vebû.
Lê piştî ku Serok Altaxus got:
”Ew qaltaxa jina te a ajan, gotinên çort bi partiyê re dike”, ruyê wî yekser çilmisî, çongên wî mîna qeysikê gundor ji hev vebûn û ha ha lerizîn.
Serok Altaxus dengê xwe baş rakir û bi ser de hilbû:
”Ew mantoşeya jina te li himberî min tevdigere, xelkê ji şoreşê sar dike û tu jî mêritiyê jê re dikî! Gelo tu jî ne ajan bî?” got û li bendî bersiva xwe sekinî.
Çolo ew nebersivand. Him bixwestaya jî nikarîbû.
Zimanê wî şikestibû. Li şensê wî ku hewrekî tenik peşkên baranê bi ser baregehê de dixurbilandin û bi lez dihat.
Serok Altaxus jî zêde li ber a xwe neda; bi niçeniç li ezmên nerî û vê carê jî ji edaleta Xwedê peyivî:
”De ji xwe re lê binerin bê çi dike! Heger ev baran di destê yekî bi aqil de baya, wê bi haweyekî sosyalîst bi kar bianiya û baranê têra temamê dinyayê kiribaya. Li hin cihan şilî, li hin cihan ziwahî, li Efrîqayê xelk ji tîhnan dim-
100
rin û li Ewrupayê jî ji avê pirtir tiştek tuneye.”
Baranê piçekî xurt lê kir û bêvila wî herikî. Şêrgeleyê destê xwe dirêjî bêvila wî kir, lê wî destê xwe li ê wê xist û dest bi wir de pekand. Şêrgeleyê destmal dirêjî destê wî kir; destmal ji dest negirt û bi qehr gopalê xwe bi ezmên de hejand:
”Vê baranê bisekinîne! Ez tu me û tu jî ez im, lê ez ne wek te me. Baranê bisekinîne, bisekinîne!...”

Baran sekinî. Barana ku dibariya, şapek bû û şapên li
deşta Keleha Mezlûman jî bi hilmekê re derbas dibûn.
Lêbelê Serok Altaxus bi haweyê ku baran li ser emrê wî
sekinîbû xwe nepixand. Awirek li Çolo veda, gopalê xwe di
zikê wî de rakir, ”ax ji destê aqilê we û xwedayê we”, got
û bi lez ji baregehê da rê. Bi çûna wî re Nûnerê Disiplîne
jî tarîxa dêlindêzê serguherî adin î rojê kir û berê şêrgeleyan
da Akademiya Ilim û Edebê.
Piştî dêlindêza li Baregeha Şoreşê bi nîv seetekê, du şêrgeleyên
bi keleşkof Çolo dan ber xwe û ew rast birin Mehkemeya
Şoreşê. Mehkemeya îro ji a doh hinekî cihêtir bû.
Mehkeme ji heft endamên mehkemeya doh pêk hatibû.
Çar ji wan jin û sisê jî mêr bûn. Seroka mehkemeyê dîsa
Sevgî Hanim bû. Li hewşa mehkemeyê ji bilî sê şêrgeleyên
bi kêr û xincer û demaçe û sisê jî termkêş wekî din şêrgele
tune bûn. Li erdê cendekê xortekî ku bi demaçê hatibû
kujtin belawela vezilandîbû. Xuya dikir ku pir qêriyabû.
Devê wî û herdu çavên wî jî vekirî bûn. Tev li Çolo, du
keç û xortê ku di dêlindêzê de ji Serok Altaxus re gotibû
”qerwane amade ye komutanê min”, çar girtî li ser pêyan
101
bûn. Keçik mîna pilingekê bû. Du şêrgeleyên wek du
qedeneyan ew zeft kirbûn û wê jî ha ha him tifî wan dikir
û him jî bêwestan digot:
”Ez we û serokê we mîna kêzik û kurmikan dibînim. Ez
ji we natirsim! Ma mirov ji kêzik û kurmikan ditirse? Bihêlin
ez xwe bikujim da hûn bibînin ku xelkê me ne bi tenê
kêzik û kurmikan, qehremanan jî diafirîne! Bimrin kêzik û

kurmik! Bimre xwefiroşî!...”
Sevgî Hanim bi dengê xwe ê herî bilind qêriya:
”Hûn çi sekinîne? Vê dêlika jinan zû ji hev perçe perçe bikin!”
Hersê şêrgeleyên xwînrij li dor keçikê xelek girtin û keçik bi derbên kêr û xinceran ji hev re avêtin.
Piştî ku deng ji keçikê biliya û şêrgeleyên termkêş termê keçikê bi ser termê xortê kujtî de şeg kirin, Sevgî Hanim dîsa bi zirt peyivî:
”Mûso!”
Mûso jî bêyî ku li marîfeta gotinê bifikire, hema pê ve danî:
”Emir bike komutanê min, qerwane!” got û di cih de sekinî.
Ji bilî Çolo her kes ji dil beşişî. Lê beşişandina seroka mehkemeyê hinekî beloq bû. Wê diteriqand. Dev lêva xwe jî dikir.
”Mûso, te di dema dêlindêzê de heqaret li hîmdarê sosyalîzmê û serokê Rohilata Navîn kiriye. Ma rast e?”
Serokê got û nola ku ji aqilê wî tiştekî fêhm bike ziq lê nerî.
102
Mûso jî bi haweyê ku li eskeriyê bû jê re patev da û bi dengekî bilind got:
”Rast e komutanê min, Mehmet bi rê de qerwane rijandibû û min jî heqaret lê kir.”
Sevgî Hanim piştî vê bersiva Mûso dev ji pirsên xwe berda; bêhnekê di guhê endamên mehkemeyê de kire pistepist

û hema pê re jî biryara mehkemeyê got:
”Li gora qanûna partiyê benda yekê, her mirov û mirova ku bi haweyekî girtî derket pêşberî Mehkemeya Şoreşê sûcdar e. Û li gora benda duduyan jî girtî her çiqasî mafdar be ji benda yekê mehkeme dibe.”
Destê xwe li Mûso hejand:
”Ev ehmeq sûcdar e!”
Sênga xwe bi ser maseyê de tewand û çavên xwe kutkutandin:
”Mûso, li ser asasê qanûna benda yekê bi cezeyê ku 700 seetî di beşê Hedayetê de ji bal îdeologên partiyê ve hedayet bibe hatiye cezekirin.”
Ji nişkê ve rabû ser xwe:
”Wî qeşmerî zû ji vir bibin!” got û hema rûnişt.
Niha êdî dor hatibû Çolo. Sevgî Hanimê awir tê difirandin û Çolo jî li himberî wê mîna parsekên Sefwa û Merwayê piştqop rawestiya bû.
”Çolo!”
Çolo bêyî ku serê xwe rast bike çit sekinî.
”Çolo li min binere da mehkeme tiştên ku di hindurê serê te de ne, di çavên te re bibîne.”
Çolo ew deng nebir xwe. Sevgî qîjek da. Qîja wê mû ji
103
qîjên qereçiyên yogoslavî bernedabû.
“Li min binere, kero!”
Çoloyê ku hebitîbû lê nenerî.
Sevgî bi hêrs rabû ser xwe û bi wê hêrsê jî rûnişt. Lê çawa ku rûnişt, kursî ji bin pekiya û serpiştkî di ser hev re qulipî. Zû rabû ser xwe û bi haweyê ku tiştek neqewimîbû

liblibî peyivî:
“Çolo, li gora delîlên ku ji bal çend gundiyên dilxwazên partiyê gihane destên Mehkemeya Şoreşê, Sînema jina te ajan e. Îcar tu ji vê yekê re çi dibêjî? Ev yeka han rast e ne?”
Çoloyê ku zimanê wî şikestibû qet tevnelebitî. Di rengê wî ê reşxeriqî de jî guhertin çênebû.
Sevgî Hanimê asas hêrsa nava xwe a ku di kursiyê de werbûbû di vê kêlîkê de da der. Jinik soromoro bû, bi hêl rabû ser xwe, bêserî li wê navê çû û hat, çavên xwe girtin û devê xwe vekir:
“Zirtekê mêran, tu bi kîjan cesaretê dikarî pirsên min nebersivînî. Tu ewqasî tajiyekî mezin î, ha! Tu min protesto dikî, hi! Ez idamê didim te!”
Rûnişt û destê xwe hejand:
“Wî kûçikî bibin zindanê”, got û tif kirê.
Dîsa rabû ser xwe:
“Û wî bi şev bikujin!”
Termkêşan jî hema Çolo dan ber xwe û meşiyan. Lê hîn du sê gavekî neçûbûn, Sevgî Hanimê dengê xwe li wan kir:
“Ka hinekî xwe ragirin”, got û vê carê jî bi endamên mehkemeyê re peyivî:
104
”Hûn jî idama wî dixwazin, ne?”
Hemiyan bi hev regotin ”erê” û termkêşan Çolo ber bi Zindana Şoreşê de birin.
Bi rê de Çolo bi zorê xwe li tena digirt. Termkêş ketibûn bin milên wî û ew di nav xwe re dibirin. Lê piştî ku

li hewşa zindanê çavên wî bi Kamil Hesê ket, hejhijî û di nav destên wan de xiliya. Termkêşan jî hema destên xwe dirêjî bêrîkên berdilkên xwe kirin û şûşeyên gazê û pîvaz derxistin. Yekî gaz niqutand devê wî, yekî pîvaz pelixand û da ber bêvila wî û ê din jî ew bi şiqaman da ber hev.
Çolo zû bi ser xwe ve hat. Lê çawa ku bi ser xwe ve hat û çavên wî li cendekê Kamil Hesê ket, vê carê jî hinavên wî di ser hev re qulipîn, elqek çû elqek hatê û zehferan beliqand. Kamil Hesê şilfîtazî daliqyayî bû û canê wî bi kêran hatibû terişandin. Ji xwîna ku ji cendekê wî dinisilî, xuya bû ku berî bi nîv seetekê filan hatibû kujtin.
Çolo xerab ketibû û termkêş jî divabûn di lingê lingdan de vegeryabana mehkemeyê. Girtiya din jî serî hildabû û hatibû kujtin. Di dawiyê de termkêşan Çolo bi saxî bi dû xwe de kişkişandin ber deriyê hicreyên kor, ew teslîmî dergevên kirin û bi terman ve beziyan. Dergevên jî piştî ku bi qehr deriyê hicreyê vekir û ew li ber derî sekinand, ”pîso” got û heta ku jê hat pehînek li der qûnê xist. Çolo bi pehîna wî re kumişî û eniya wî li dîwêr ket. Enî neşikest, lê heger şikestibaya belkî ewqasî neêşabaya. Enî hema pê re bi qasî gupikekê werimî. Dergevên guh li gupikê nekir, empûl lê vemirand, deriyê hesinî li ser xiliqand, xebereke genî pê re kir û bi hoqeboq ji cem da rê.
105
Çoloyê ku bi carekê ve ji dest xwe çûbû û heyvanê mêraniyê li ba nema bû, di hicreyê de hêdî bi hêdî bi ser xwe ve hat û li ”ajantiya” jina xwe fikirî. Bi qasî ku li ajantiya wê fikirî ewqasî jî mêr û degel bû û li jinikê geft xwarin:

”Mehkemeya Şoreşê meqamekî miqedes e. Mirovên ku li wî meqamî kar dikin ne ew ên bi henek û menekan e. Helbet hemû jî jîr û zana û xwedî ûjdan in. Li wir tiştên bi derewan nayên gotin. Û a din, Serok Altaxus ne mirovekî xalî ye. Emir li baranê kir, baran sekinî. Wî bi xwe jî got ku jina te ajan e. Û heta dibe ku ez jî ajan bim. Mirov nikare her tiştê xwe bibîne, lê ên wek Serok Altaxus dikarin heta bi lepta damarên mejiyê mirov jî bibînin. Sînemkê ajan e. Ê ne heger ez bi saxî ji vir derketim û min ew xiyaneta ku te bi Serok Altaxus re kiriye ji te re hişt, bila ez ne ji pişta wî Qurmoyî bim!” Qurmo bavê wî bû.
“Sînemkê mareke teyar bû û di ber min de bû…”
Mêrik bi vî haweyî gora jina xwe dikola û ji nişkê ve deng bi dergevên ket:
“Çolo xwe amade bike!”
Qurpînî bi nava wî ket, rikrikî û dîsa bû ew ê bi nîv seet berê.
“Haho, heval tên ku min bikujin! Ev deqîqeyên min ên dawî ne!”
Dergevên mifteya ku bi dest xwe ve girtibû li derabeyan dixist û dihat.
”Heval wê min bi kêr û xinceran perçe perçe bikin!”
Deng bi derî ket.
106
”Hahooo!” got û serê xwe bi nav pûşê ku wek doşekê dihat bikaranîn de bir.
Dergevan kişiya hindur.
”Wey li mino, wey li mino!...”

Dergevan li ber sekinî:
”Rabe ser xwe tirsonek”, got û bi serpozika sola xwe li lingê wî xist.
Ranebû û kelûgirî got:
”Rast e, Sînemkê ajan e. Ez jî ajan im. Û heta bi zarokên min jî belkî ajan bin! Lê min bibexişînin. Firsetekê bidin min…”
Dergevanê ku gelekên wek vî Çoloyî di bin destên wî re derbas bûbûn devlikenî got:
”Rabe ser xwe, Serok li meqamê xwe li bendî te ye.”
Çolo pêşî bawer nekir. Lê piştî ku dergevên got “Serok wê te bike berpirsyarekî mezin”, mîna qantirekî şemûs çengî wê navê bû û ha ha got:
“Çi, çi, çawa, çawa?”
”Dirêj neke; pûş mûşê bi xwe ve dawişîne, tu derdikevî meqamê Serok”, got û bi hev re ji hicreyê derketin.
Serok Altaxus bi Çolo re li asêgehê bi tena serê xwe rûnişt. Asêgeha wî bi felqeyên zinaran û dirgên betonê li ser du qatan hatibû avakirin. Lê herdu qatên wê jî di binê erdê de bûn. Asêgeh bi qasî du-sê lat erd ji şergehê dûr bû.
Di wê rûniştinê de Serok Altaxus, ji zimanê xwe bêhtir hej û weşa gewdeyê xwe bi kar anî. Awir jî pir tê difirandin.
Geh xwe li ser kursiyê vediparimand û bi haweyê ku
107
di bin zikê xênî re ezman didît, ziq li hewa dinerî û digot, ”ew jî ajan e, bikuje!” Geh radibû ser xwe û bi haweyê ku binê erdê didît, ”lê xe”, digot û bi lingên xwe erd diteptipand.
Geh bi haweyê ku bi dû hinan diket, rehwankî û

telebkî dibeziya û ji nişkê ve mîna komutanên behrî li ser du lingan dizîvirî û awir di Çolo de vedidan. Carekê hindik mabû ku Çolo ji ser kursiyê ketibaya.
Serok Altaxus piştî ku qederê çarîkekê bi Çolo daket û xwe wek asas nîv yekî ezmanî pê da qebûl kirin, gazî Nûnerê Ûjdan Muhterem Simê kir. Muhterem Simê jî çawa ku ket hindur, kaxet û qelem da dest Çolo û di temenê de sekinî. Çolo destê xwe rakir. Serok Altaxus bi şikenandina çavan re destûra peyvê dayê.
”Serokê min, ez ji zimanê çolî bêhtir bi zimanê kohî dizanim binivîsînim.”
Hinekî bêhna xwe teng kir:
”Herdu jî ne tu gû ne!”
Bi hêrs ji ser kursiyê rabû. Bêhna xwe tam teng kir, mîna ahtapotan temamê lebatên xwe livandin û bi qîjewîjeke qereçiyane got :
Îcar ev nebû. Yanî niha bi rastî tu nizanî bi zimanê hovî, ha? Tu ker î ker!” Ber pê de meşiya.
”Heger te hetanî niha xwe hînî hovî kiribaya, tu ê niha jî wilo mîna kerekî beredayî li himberî min nesekinîbaya!”
Bi berstika wî girt û hejand:
”Hovî zimanê medeniyetê, bergîl!”
Tif ser dev û ruyê wî kir:
”Asas sebeba ku bav û kalên we dewar mirin, aha ev
108
zimanê genî bû”, got û tiliya xwe di devê wî de rakir.
Çolo devê xwe bi ser hev de şidand. Lê Serok Altaxus jî nexwest ku tiliyê têxe hindurê devê wî; xwe ji ser da alî, pê

bi pê çû û peyva xwe a dawî got:
”Lê ez ê wî zimanê rezîl û lewitî ji wî devê we ê genî hilqetînim!”
Çolo destê xwe rakir û bêyî ku destûrê bistîne peyivî:
”Serokê min ê herî mezin, min bibexişîne. Min nizanîbû ku hovî li ba cenabê te zimanekî ewqasî girîng bû. Şensekî bide min. Ez bi wê qudreta te a bêhempa sûnd dixwim ku ez ê di hindurê du hefteyan de tam hînî xwendin û nivîsandina wî zimanê payebilind bibim.”
Serok Altaxusê ku ji nav temamê karên xwe bêhtir di karê zimên de bi serketî bû, dengê xwe nekir; serê xwe li Muhterem Simê hejand û derbasî odeyekê bû. Muhterem Simê jî hema bi Çolo ve qedimî:
”Tu dikarî bi zimanê çolî binivîsînî”, got û dest pê kir:
”Sernivîsa istixfarnameya xwe, bi tîpên mezin binivîsîne ku tu ne tiştek î.”
Çolo wilo nivîsand.
”Bav û kalên min bêşexsiyet bûn. Û ez jî tam bêşexsiyet bûm. Û bi ser de jî ez û jina xwe em herdu ajan bûn.”
Çolo ew jî nivîsand.
”Serok Altaxus ez bi şexsiyet kirim û ez xistim nav refên şoreşa insaniyetê.”
Çolo piştî ku got ”wilo ye heval, wilo ye”, bi lez nivîsand û bêsebir li bendî a ku bi dû de dihat sekinî.
”Ez li ser şeref û namûsa xwe sûnd dixwim ku hetanî ez
109
hebim ez ê girêdayê Serok Altaxus û destûr û rêbazên wî bim.”

Çolo di vir de hinekî awiqî. Muhterem Simê ”zû binivîsîne”,
got û ji serî de nivîsa wî xwend.
Di nivîsê de kêmanî tune bû.
”Imze bike!”
Çolo bi imzeya xwe a ku li eskeriyê bi kar dianî ”istixfarname”
imze kir û da destê wî.
Di wê navê re deng bi derî ket û Serok Altaxus kişiya
hindur. Muhterem Simê jî hema istixfarname danî ser
maseya wî û bi lez ji hindur derket.
Serok Altaxus li istixfarnameyê nerî û beşişî:
”Ahaaa kero, wey bavo, de ji xwe re li imzeya wî binerin,
heh! Imzeya wî ji a min jî xweşiktir e, kuro!”
Çoloyê ku serê xwe berdabû ber xwe û ji kêfan re dikir
bifiriya, lê venegerand.
Serok Altaxus rabû ser xwe, berê xwe jê guhert û pê re
peyivî:
”Ez ajantiya te efû dikim. Tu ji niha û pê ve êdî ne ajan
î. Lê divê tu jî xwe ji min re tam bipeyitînî ku bi rastî tu
ne ajan î. Û heger ku tu ketî çavên min, ez ê te bikim berpirsyarê
asêgeha xwe jî.”
Serok Altaxus piştî ku hinekî bêhna xwe berda, dîsa tena
bi tena jê re got:
”Bi dû karê te ê pêşî de karê te ê herî girîng ew e ku tu
xwe tam fêrî xwendin û nivîsandina zimanê hovî bikî,
deyûz. De heydê zû ji ber çavên min biqeşite!”
Çolo bi bez ji ber çavên wî qeşitî.
110
Vegera Çolo

Roja ku Serok Altaxus Çolo bexişand, berpirsyariya asêgeha xwe li ber xist û di a din î rojê de Çolo bi xezeb berê xwe da herêma Têrê, Sînemê jî li berê xwe ê ku jê girtibû hayî bûbû.

Çolo û pazdeh şêrgeleyan bi hev re, di roavayê Qamîşê re derengî şevê, bi dizî li hidûd xistin û sertêl bûn. Eskeran ew dîtin û guhên xwe li wan ker kirin. Û heta bi haweyê ku kemînên xwe pêş wan bikin, çixareyên xwe pêxistin û bi dengê bilind bi hev re peyivîn. Di tabiyekê de jî radyo vekiribûn. Dengbêjeke bi nav û deng distira. Carcarê di nav stranan re dipeyivî jî. Lê şêrgeleyan ew tevgera han hemû bi newêrekiya wan û wêrekiya xwe ve girêdan û mêraniya xwe pesinandin. Şêrgele ewqasî ji ser xwe çûn ku heger eskerekî xwe kiribaya hevalê wê dînitiya wan û ji canelametî fîşekek teqandibaya, li wî cihê ku mîna kefa destan rast bû, yek ji wan jî wê sax nefilitîbaya. Hemû hîn di derba xweşkêş û metilyozên kemînan de bûn û ji xwe re û me re bi hev re dipeyivîn.

Şev sahî û erd jî hinekî ziwa bû; karwanê şêrgeleyan li xwe da û bi hilm û pifekê re xwe gihand çiyayê Omarê. Ji rêya Talanê û hetanî bi çiyê, ji xwe qey seetek rê dikişand. Lê karwan ji seetekê kêmtir çû.

Li çiyê şêrgele bûn sê bir, Çolo bi tenê berdan û her birek bi aliyekî de çû. Çolo jî bêyî ku rêya xwe bi hin gundan bixîne berê xwe da hindama Kerçoxê, geft li Sînemê xwarin, keleşkofa xwe lê hejand û mîna hespê ku di bin

111

barê qaçaxê de li nav mayinan dixist, habela lezand. Îdeologan

bi qasî hefteyekê zeman dabûnê; lêbelê wî dixwest ku hema karê xwe biqedanda û di lingê lingdan de li wan vegeryabaya. Barekî giran û ewqasî jî girîng li ser pişta wî bû! Li Keleha Mezlûman kêşek karê ku divabû kiribaya li bendî bû.

Çoloyê ku çiya û newal qevz dikirin û bêwestan diçû, piştî ku di çiyayên Omarê de li xwe kir sibeh, bi qasî nîv seetekê bêhn veda û xwar û vexwar, bi xezeb da xwe û bêyî ku li kemînên eskeran bifikire gavên xwe dirêj radan. Lê her ku bi wir de çû, gavên wî kin bûn û bi hinavên xwe daket. Xwarina wî nanê sûkê û helaw bû. Nan ji bal kohiyên bajarî, helaw ji bal çoliyên binê beriya Çolistanê çêbûbû û ew jî tam çiyayî bû. Û bi ser de jî pîvaz xwaribû. Pêşî berşoşkî û dû re jî virikî û zikêşî bû. Lê digel wî haweyî jî mêrik bi esirkî re xwe gihand gund. Li gund neçû malê; li ber deriyê mizgeftê rawestiya û bala xwe da ser tehta ku melayê gund li ser vezilandibû û bi keviran kujtibû. Li gora wî mela heqaret li Serok Altaxus kiribû. Piştî ku bêhnekê ponijî, bi pîrejina ku xêrhatin tê de da gazî jina xwe kir. Çarîkek neket wê navê dengê jina wî ji dûr ve hatê. Sînema ku bi kêf û eşq dihat, gihabû navtara gund. Herduyan piştî ku hevdu dîtin, vê carê jî jinikê lewkand, lê hîn jî baş ji hev dûr bûn. Pênc-şeş mal di navbera wan de mabûn. Sînemê nêzîkayî lê kir û beşişî. Lê wî xwe bi ser hev de zewirand, diranên xwe mîna kerê di bin barê xwêh de lê qîç kirin û awir tê firandin. Sînemê giha ber mextela mela, herdu destên xwe ber pê de dirêj kirin û got:

112

”Ruhê min, ê ne tu nizanî bê di van çend rojan de şûna
te bi min û zarokan çiqasî xuyanî dikir…”
Çolo devê xwe ê çatirî bihustekê ji hev vekir:
”Gewenda ajaaan!” got û cercûrê keleşkofê lê vala kir.
Gundî zû li dengê keleşkofa wî derketin; li ser cendekê
Sînemê kom bûn û li wê û wî temaşe kirin. Lê ne jinekê û
ne jî mêrekî wêribû gotinek pê re kiribaya.
”Min ajaneke ewqas mezin ceze kir ku hindik mabû
Serok daba kujtin”, got û bêyî ku zarokên xwe bibîne berê
xwe da Keleha Mezlûman.
113
BEŞÊ DUDUYAN
“Ser bi qurban,
can bi qurban,
hemû bi qurban, ey Serok!”
Şêrgele
114
Serok Altaxus û îdeologên wî
Kelkela germa havînê bû. Serok Altaxus di asêgehê de
herdu lingên xwe avêtibûn ser hev, dewê qerisî vedixwar û
îdeologekî partiyê da devê derî:
”Serokê min, di rêya navê wan re me xwe gihand xayintiya
wan.”
Serok Altaxus ”çi, çi, çi?” got û bi qasî rimekê ji cihê
xwe bilind bû.
Bi destê çepê bêvila xwe û bi destê rastê jî ruyê xwe firkand.
Bi firkandinê re herdu lepên wî jî şil bûn. Dîsa bi
bapêşê ketibû.

”Te got çi, te got çi? De ka dîsa bibêje?”
”Erê Serokê min, navê xwe kiriye Okyanûs!”
”Okyanûs ha!”
”Û ê din jî navê xwe kiriye Ezman!”
Serok Altaxus tam hêrs bû. Lê piştî ku bi qehr kulma xwe li maseyê xist û tasa tije çeqilmast bi ser de qulipî, ji ser xwe çû û da nav:
”Rast e, ev jî xayin in. Û heta ajan in jî! Navê bi wî rengî nîşanên ajaniyê ne. Mirovên ajan piçûk difikirin û navên mezin li xwe dikin. Okyanûs û Ezman, ha!”
Du xortên ku pismamên hev bûn, çendeyek berê beşdarî nav partiyê bûbûn û herduyan jî ji qayişa hev re, navên mezin li xwe kiribûn. Di eslê xwe de, bavê wan bûbûn sebebê wê nexweşiyê. Ji xortan re gotibûn ku divê navê we ji ên temamê hevalên we mezintir be.
”Bila wan herdu ajanan hema derxînin mehkemeyê û
115
wan li kêleka hev daliqînin. Temam, zû biqeşite, tortore!”
Îdeologê wî jî piştî ku got ”bijî Serok Altaxus”, xwe li derî girt û paşûpê meşiya.
”Ha raweste, raweste! We endamên mehkemeyê baş saxtî kiribûn, ne?”
”Erê Serokê min.”
Li Mehkemeya Şoreşê qelem û kaxet qedexe bû.
”Temam, zû biqeşite!”
Mêrik li paş xwe nenerî, zû qeşitî.
Bi çûna wî re dîsa deng bi derî ket û îdeologekî din kişiya hindur. Ev ji ê berî xwe him hinekî xişintir û him jî

jê mezintir bû. Qisûra wî a ber bi çav, serê wî şimamokî û guhên wî jî çaroxî bûn. Di ser çilî re bû. Eskerkî lingê xwe li erdê xist, kete temenê, serî bi piştê re kir yek, li bin zikê xênî nerî û got:
”Serokê min, heta ku me Zozanê nexist şikefta heftderî sûcê xwe qebûl nekir.”
Serok Altaxusê ku ji bûyera berî niha tengejî bû û bi hêrs diçû û dihat, ji nişkê ve zîvirî, ziq li qelafetê îdeolog nerî û ruyê xwe tirş kir. Piştî ku bi wahc got ”li çiyê, kildank û mirêk, ha!“ qut kir û hilmekê ponijî.
Di tûrikê Zozanê de mirêkek û kildankek hatibû zeft kirin. Li gora ku hin şêrgeleyan digot, di çavekî wê de traxûm hebû.
”Kildank tê fêhm kirin. Lê mirêk çima bi xwe re gerandiye?“ bi hêdî ji xwe re got.
Rûnişt. Bi serê xwe girt û dîsa ponijî. Lê hema bêhnek neket wê navê, çeng bû, çû û hat û qêriya:
116
”Mirêk ji bo civên e. Civan, civan!Ew û eskeran bi carî hev ketine. Ajan e! Û ajaneke ku exlaqê şêrgeleyan têk biriye. Wê bi sîlehê herî mezin bikujin!...”
Li şergehê sîlehê herî mezin keleşkof bû. Sîlehên giran qedexe bûn.
Îdeolog ”bijî Serok Altaxus”, got û mîna ê berî niha paşpaşkî çû.
Îdeologê ku weritî sekinîbû, bi haweyê berê got û wek gule çû. Çû, lê hîn karê Serok Altaxus neqediyabû. Di dorê de gelek îdeologên ku bêsebir li devê derî sekinîbûn û ha

ha xwe dixwarin, hebûn.
Hetanî pênc sal berê jî Serok Altaxus bi vî haweyê niha, ewqasî bi qanûnên partiyê ranebûbû. Mehkemeyê piştî ku mirovê girtî bi kujtinê ceze dikir, di cih de nedikujt. Ewraq dişand nig Serok Altaxus û li bendî biryara wî disekinî. Biryar jî divabû nivîskî ba. Lê piştî ku piraniya birêvebirên partiyê ên kevin, ji xafil de li çol û çiyan û li vir û wir hatin kujtin, Serok Altaxus jî bi carekê ve xwe da kar û barê heq û hiqûq û edaleta partiyê.
”Jin, hiii!!”
”Erê Serokê min, va ye bi min re ye!”
Bêhnçikyayî ber pê de çû, bi herdu milên wî girtin û mîna meşkê kilkiland. Dû re jî hema pê re li bêrîkên wî xebitî û got:
”Ka ka ka, li ku ye? Ka zû derxîne, zû, zû!...”
Sûretê ku di kefa destê îdeolog de bû ket erdê. Îdeolog xwe daqûl kir ku rahijêyê. Lê Serok Altaxus jî ew haweyê wî bi xwe ne xweş anî:
117
”Li himberî min û bêedebî, ha! Tu çawa dikarî bêyî destûra min temena xwe xerab bikî”, got û pehînek li defa sêngê xist.
Îdeologê wî ê ku bi qasî dîwarekî bû, wek zixurekî bi wê navê de pekiya.
”Serokê min, sûret li ber lingên cenabê te ye.”
Piştî ku bi destê xwe rêya derî pêşê kir û îdeolog jî paşûpê çû, wek teyr xwe dada sûret û di cih de rûnişt. Sûret nêzîkî bêvila xwe kir û da ber derbên awiran.

Keçik ji kohiyan bêhtir dişibiya ewrupiyan. Gewreke çavşînî û porzerî bû. Hivdeh-hîjdeh salî xuya dikir. Keçikê bi nameya ku ji birayê xwe ê şêrgele re şandibû sûretekî xwe jî rê kiribû.
”Ajan e, ajan! Ajana emperyalîstan e”, got û bi wahc li pişta sûret nerî.
Li pişta sûret jî wilo hatibû nivîsandin:
“Dil û canê xuşka xwe, min gelekî bêriya te kiriye. Ez ji niha û meheke din li ba te me.
Kekê min ê delal, mereqan neke ez dagirtî têm. Ha, min ew tiştê ku te di telefonê de ji min re gotibû jî bi cih anî.
Bi rastî zêdeyî qeweta min bû, le ez xuşka te me, li vê dinyayê tiştê ku ez ê nikaribim heq jê derkevim tuneye. Ez têra xwe heme.
Bye bye, I love you!
07 07 1987, Londra”
118
Pêşî ji zimanê nivîsê hinekî fêhm kir. Lê piştî ku di gotina dawiyê de asê ma, vê carê jî nivîsa kohî bi carekê ve şiband a ingilîzî û her tişt berevajî wê hizir kir.
Sûret di nav destê xwe de heciqand, bi hêl û mêl rabû ser xwe û wek hêlanê çû û hat:
”Temam, temam, ev jî yeke wek Metaharî ye; lê xwe kiriye Metakohî û beşdarî nav refên şêrgeleyan bûye. 07 07 1987, ha! Ev parola ye. Parola ên ku êrîş biribûn ser ordiyên Hîtler jî tiştekî wilo bû. Û niha jî 1996 e! Ûûûf vêna tiştek di min de nehiştiye! Li derdora min e, xwe gihandiye min. Û heta belkî di hindurê meqamê min de cihê xwe

çêkiriye û niha jî li min guhdarî dike. Min dibîne, dibîne!...”
Nehişî bi vir de û wir de beziya. Lingê wî di guhikê xalîçê
de aliqî û devdevkî kumişî:
”Eeeehew, ajanan ez hilanîm!”
Bi qîjewîja wî re hernod parêzgerên wî garankî kişiyan
hindur. Hinekan bêmefer xwe avêtin ser û ên din jî berê
sîlehan hawêrdor gerandin û li odeyên asêgehê belav bûn.
Piştî bêdengiya çend kêlîkan, parêzgeran xwe ji ser kelaxê
Serok Altaxus dan alî; li dora wî xelek girtin û bêkip
sekinîn. Di wê navê re Serok Altaxus jî hêdî bi hêdî bi ser
xwe ve hat, çarmêrkî rûnişt û çavên xwe li ser wan gerandin.
Bi tirs tibabekî li wan nerî. Piştî ku di ber xwe de kire
niçeniç û serê xwe hejand, lingê xwe ê çepê rada û destê
xwe dirêjî bêrîka şerwêl kir. Lêbelê destmalka ku lê digeriya
di bêrîka wî a din de bû. Bi lez ling ber bi xwe de kişand
û vê carê jî lingê din rada. Destmalka ku gilokî di bêrîkê
119
de baş bi ser hev de qermiçî bû derxist, da ber bêvila xwe
û bêvil guvaşt. Lê hema pê re jî firînî pê xist. Destmalk jî
mîna kincên wî sor bû.
”Ev ji bo çi hûn li dora min bûne sing, hi? Zû ji ber
çavên min winda bibin!” got û rabû ser xwe.
Heryek ji hindama xwe de paşpaşkî meşiya.
Serok Altaxus dîsa qêriya:
”Na na, neçin, bisekinin!”
Piştî ku her kes di cihê xwe de eskerkî sekinî, wî xwe ji
berê bêhtir kilkiland û herdu destên xwe bi hev re hejandin:
”Yek, serê wî ajanê ku xuşka wî sereka ajanan e bi şûr

bifirînin.
Dudu, asêgeha min bi carekê ve benzîn bikin û bişewitînin.
Sisê, piştî şewatê jî bi dozerê li erdê bisekinînin.
Çar, îcar piştî ku we asêgeh bi erdê re kire yek, bi kevirên
destarkî carekî li ser çêkin.
Erê, hi, temam?”
Hemû bi hev re qêriyan:
”Bijî Serok Altaxus, bijî Serok Altaxus!...”
”Heydê, yela yela, qut bikin, tortore”, got û bi bez li
nav wan xist. Derket derve, pê bi pê meşiya û dest bi gilî
û gazinan kir:
”Mulayim Hemê, tu jî ha! Ewqasî bênan û xwêyî nabe!
Tu mirovekî pir bênan û xwê derket. Ev li dora bîst salekî
ye ku ez te bi xwedî dikim. Tu bi nanê min mezin bû. Ma
min çi da te û çi neda te! Tu bêşexsiyet bû; heta bi wê jî
120
min da te. Min tu hînî şer kir û yazdeh salan min tu kire
serşêrgele. Li Kohistanê cihek nema ku te nedît. Çiyayek
nema ku tu lê raneza. Çem û kaniyek nema ku te av jê venexwar.
Aha min ew firsetên wilo mezin hemû dabûn te. Û
digel wêqas qenciya min tu ê jî xayintiyê bi min re bikî, ha!
Û bi ser de jî tu taaa ji Londrayê ajanan bi hewara xwe de
tînî!
Pêşiyê kohiyan rast gotine, çêlîkên maran bêjehr nabin.
Zarokên şêx û melan, beg, mîr û axan nikarin terbiyeke
prokerî bistînin…”
Bi haweyê ku hin wî zeft bikin, ji nişkê ve ruyê wî li
hev qulipî; sekinî û mîna qertelan di hawêrdora xwe de

awir firandin. Dû re jî mîna pilingan xwe da ser hev û kire nirenir. Ji wî pê ve kesekî jî li wan derdoran xuyanî ne dikir. Di eslê xwe de ev tebîhetekî wî bû. Her tim wilo dikir.

”Lêbelê zarokên prokeran”, ji proleteran re digot, ”feqîr û belengazan ji wan jî xerabtir in. Di van kohiyan de cewher nîne; hemû ker in.”

Piştî ku bêhnekê li asêgeha xwe temaşe kir û ser dev û ruyê xwe firkand, bi kelûgirî peyivî:

”Erê delala min, êdî tu jî nema dikarî min di himbêza xwe de bisitirînî; ajan ketine himbêza te. Ma bi tenê ketine wir! Nav partiyê tije ajan bûne. Ez çiqasî wan dikujim xelas nabin. Partî bûye partiya ajanan. Ez ê çawa bikim? Ez ê çawa bikaribim xwe ji wan biparêzim? Ez divê xwe têxim cihekî wilo ku ez her kesî bibînim û kesek jî min nebîne.”

Xwe berda ser qerevîzkan û bîstikekê ponijî. Dû re jî ji

121

nişkê ve veciniqî, rabû ser xwe, li ezmên nerî û peyivî:

”Temam çêbû, min ew cih peyde kir. Pereyên min ji axê jî pirtir in û her tişt jî bi pereyan dibe. Bi qeweta wan ez dikarim bi tena serê xwe di qorziyeke ezmên de bijîm.”

Sekinî. Xwe ji newqê û berjêr de lewliqand. Meşiya. Pelxemek di wê navê de werkir, lezand û bi dizî got:

”Gelo teyare li ezmên dikare bisekine?”

Bi kêf nîvê bersiva xwe da:

”Mesele helîkopter dikare bisekine.”

Çitikî rawestiya, zikê xwe firkand û dîsa ji xwe pirsî:

”Baş e, me got ku teyare jî disekine. Îcar bidestxistina

wêqas benzînê wê çawa bibe?”
Ruyê xwe tirş kir, bêvil herikî. Bêyî ku firîniyê pê bixîne bêvil paqj kir, serê xwe hejand û bi dilekî sar got:
”Ev teyare, bi kêmanî rojê wê tankêreke benzîn bişewitîne. Û wî çaxî jî benzîna vêqas dinyayê a min be wê têra min nake, weh!”
Bi hêrs pehînek li kevirê ber lingê xwe da. Kevirê ku bi qasî lagekî mezin bû, heger zêde çûbaya belkî serê tiliyên wî ewqasî neêşiyabana û dengê xwe zêde ranekiribaya:
”Na, teyare jî nabe!”
Bi dengê wî re 40 şêrgeleyek garankî ber pê de beziyan. Serok Altaxus jî piştî ku li wan nerî û hinekî bi wê rewşê beşişî, destê xwe li wan hejand û ew vegerandin.
”Gelo mirov li qorziyeke ezmên wek sêlikeke televizyonê filan nikare bi cih bibe?”
Tam li ezmên nerî. Wir jî neket serê wî, bêhna xwe teng kir û got:
122
”Ma CÎA û MOSAD dihêlin ku ez ji xwe re li wir bistirim! Pîç in, wê bi min bihisin û bi roketêkê min wek qerpalekî ji wan deran de bînin xwarê.”
Xwe da ser lingekî û destên xwe xistin kêlekên xwe. Serê xwe jî berda ber xwe. Di wê navê re kêzikek ber pê de dihat. Kêzik dît. Lingê xwe bilind kir ku wê biperçiqîne, lê pê re negiha. Kêzikê bi lez xwe li nav şeqan xist û derbas bû. Heta ku li pişt xwe zîvirî, kêzikê xwe berda qelşikekê û ji ber çavên wî windabû.
”Ma qey ez wek vê kêzikê jî nayêm, hi? Ez divê cihekî

ku ez her kesî bibînim û tu kes jî min nebîne ji xwe re peyde bikim”, got û bi lez ji xwe re li cihekî geriya.
”Mesele, li çiyê ez dikarim xwe têxim qelşekê, qulekê, berqefekê filan û bêvan. Û bi ser de jî çiyayên Kohistanê dikarin ordiyên herî mezin veşêrin. Û veşartine jî.”
Herdu destên xwe hejandin û tewirand:
”Tew tew, rast e, çiyayên Kohistanê dikarin ordiyên herî mezin veşêrin, lê wê nikaribin min veşêrin.”
Ji jêr ve li ser û sekêhê xwe nerî:
”Temamê ordiyên dinyayê têkevin ser hev, hîn nagihên kaboka min!”
Bi simbêlên xwe lîst û simbêlên tapanî bi jêr de kişandin. Ji dûr ve devê wî hîç xuya nedikir. Carina ji nêzîk ve jî wilo bû. Serê wî ê mezin, porê wî ê bi tof û simbêlan li hev dixwar. Lê bejina wî a dirêj û zikê wî ê telêrî qet bi hev nediket.
”Dewletên emperyalîst hemû li min digerin!”
Piştî ku hinekî sekinî, ”xwezîka bi tenê dewletên emper-
123
yalîst bana, temamê kevneperestên dinyayê a xwe li min kirine yek û li min digerin”, got û mîna eskerê ku ji izbatan direviya bi tirs li derdora xwe nerî.
”Ez ê çawa bikim? Ez birevim, ez bimînim?
Derbasî nav bexçeyê xwe bû, di bin dara tuyê de rûnişt û da aqilê xwe:
”Ez ne karim birevim û ne jî karim bimînim.”
Xwe li ser enîşkê palda:
”Lêbelê rev ji mayinê çêtir e. Di revê de girtin û di

mayinê de kujtin heye.”
Li qûn rûnişt:
“Howeh kuro, mirovên wek çiyan li dora min civiyabûn!
Derdora min bi çiyan hatibû rapêçandin. Min bi destê
xwe mala xwe xerab kir. Min çiya qulipandin! Min yekî bi
du qurûşan li dora xwe nehişt. Proleter, proleker, kurtan...”
Bi qehr li derdora xwe nerî. Tu kes nedît, lê her kesî jî
ew didît. Xwe devdevkî veziland, devê xwe xist erdê û bi
dizî got:
”Çima min bi destên xwe, wan bi destên min mala min
û me hemiyan xerab kirin; wan ev rû da min; wan ez tirovirî
kirim.”
Pişt re jî ”ev ez çi dibêjim”, got û bi dengê ku ji şergehê
bilind bû, hilqevizî.
Îdeologan serê Mulayim Hemê ku deh salekî li çiyan bi
eskeran re şer kiribû, bi şûr firandibûn, tev li kelêx dişewitandin
û bi siloganan diqêriyan.
”Yamyam in, yamyam! Sibehê jî dora yekî din ji wan e.
Aha ev e malê min(!)”
124
Dîsa ponijî. Vê carê jî li ser pêyan. Lê hilmek-dudu
neketin wê navê qelqilî; xwe berda ser çongan û qerevîzkî
rûnişt. Lê çawa ku rûnişt wilo jî çeng bû û heta ku giha
ber deriyê asêgehê beziya. Li wir xwe dada das û çakûçê ku
digel bivir û bêra bi dîwarê asêgehê vebûn. Das bi destekî
û çakûç bi destekî girt; xwe bi ser hev de guvaşt û guvaşt
”karrr kerrrr!” got û bi dîwêr ket.
Piştî ku ruyê xwe hinekî bi xwîn bû, das û çakûç avêt

û vê carê jî bi bivir û bêrê êrîşî dîwêr kir û ha ha got:
”Aha ez ê zikê emperyalîzmê wilo biçirînim, wilo bidirînim, wilo hiltirînimmm!”
Di dawiyê de îdeologekî ji nav koma îdeologên ku lê temaşe dikirin xwe negirt, ber pê de beziya û kelûgirî peyivî:
”Serokê min, ez xulamê te me bes e; tu ê xwe bikujî û deriyê me li heft deriyan bigerînî. Em û temamê miletê kohî, bêyî te hîç in! Û heta tevaya miletên Rohilata Navîn…”
Serok Altaxus nehişt ku dirêj bike, bivirek dawişand wî jî. Bivir li pişta wî ket, ji hindam de kişiya erdê û di nava xwînê de gevizî. Heger Serok Altaxus bivirekî din lê nedabaya belkî mêrik di cih de nemiribaya.
Serok Altaxus mirovekî bi dar û ber û xişin bû. Di eslê xwe de her tiştê wî xişin, girs û mezin bû. Sênga wî bi qasî a conegayekî fireh dihat. Lê pirça sêngê hinekî firk bû. Pirç jî mîna porê xwe ê bi tof û simbêlên xwe di boyaxa reş de dihişt. Pozberanî bû. Çavên wî, mû ji ên pilingan berneda bûn. Lê awirên wî, di rengê ên qertelan de bûn. Ferşên lin-
125
gan û çepilên wî ên dirêj li hev dixwarin. Serok Altaxus bi vî qilafetê xwe ê niha, tam dişibiya gladyatorên romayî.
”Temam, êdî ez ê xwe di binê behrê de veşêrim”, got û ji ser termê îdeologê xwe da rê.
Lêbelê hîn pênc-şeş gavekî neçûbû, dîsa xwe guhert û bi qîjewîj got:
”Îcar ku CÎA û MOSAD bi min hisiyan wê çawa bibe?
Ez ji ber van nema dizanim bê ez ê bi kîjan tehtilerdê de

biçim!...”
Serok Altaxus piştî ku ne li erdê, ne li ezmên û ne jî di binê okyanûsan de starek ji xwe re nedît, bi ser parêzger û îdeologên xwe de qêriya, kaxet û qelem ji wan xwest û li qemyona xwe siwar hat. Parêzgeran bêmefer kaxet û qelem jê re anîn. Qemyon dixebitî, şifêr pê li xazê dikir û berdida û wî jî dinivîsand.
”Min navê partiyê guhert û kir Partiya Sosyalîstên Gundî. Di vê derbarê de sibehê civînekê li dar bixînin, ji vê civînê re hûn dikarin kongre jî bibêjin, û partiya me a nuh îlanî dinyayê bikin.”
Serok Altaxus
04 07 96, Keleha Mezlûman”
Piştî ku kaxet dirêjî destê îdeolog kir û pê re beşişî, ji şifêrê xwe re got ”heydê yela!” qemyon çeng bû û şêrgeleyên ku garankî li wê navê sekinîbûn bi toz û dûyê wê re
126
habela kuxuyan.
Ev cara pêncî û şeşan bû ku Serok Altaxus bi vî haweyê niha direviya bajarê Çamê.
Di a din î rojê de li derdora nîvro, cîbeke sergirtî li pêşberî asêgeha ku şêrgeleyan ew bi erdê re kiribûn yek sekinî. Çawa ku cîb sekinî wilo jî parêzgerên asêgehê ber pê de beziyan û li deriyên wê xebitîn. Lê Serok Altaxus zû ji cîbê daket û bi wan re xeyidî:
”Yela, yela, zû ji vir herin”, got û bi destê xwe rêya deriyê şergehê şanî wan kir.
Pişt re jî li cîbê vegeriya û heta bi navikê xwe dirêjî hindurê

wê kir. Bêyî ku tiştekî bibêje, bi destê jinika ku li ser daketinê bû girt û bi hemd ew daxist. Tev li şifêr, ê din jî ji cîbê peya bû. Bi dû ku hemû bi lez daketin, li hev kom bûn û bi balkêşî qederekî li erd û ezmên temaşe kirin. Di wê navê re Serok Altaxus jî ecêbmayî li wan dinerî û guhê xwe dabû ser pistepista wan. Hemû jî bi zimanê hovî dipeyivîn. Xeberdana wan a bi dizî jî bi zimanê hovî bû.
Di dawiyê de Serok Altaxus xwe negirt:
”Mîrzano, de ka em dest bi karê xwe bikin”, got û bêyî ku li bendî bê ka ew çi dibêjin ne sekinî û meşiya.
Hersêyan jî dev ji pistepistê berdan û bêgotin eskerkî dan dû. Ji bilî Serok Altaxus û jinikê, herduyên din bi bahol bûn. Baholên wan baş mezin bûn. Û bi ser de jî hetanî bi dev dagirtî bûn. Bahol sor bûn.
Mirovê dawiyê bi qasî lepekî bû. Mirovê li pêşiya wî ji wî jî hûriktir bû. Lêbelê a ku dabû dû Serok Altaxus, kare-
127
ke xezalan bû. Stuyê wê ji ê qazê jî dirêjtir bû. Ruyê wê mîna camê dibiriqand. Zilfên qeytanî, xelek xelekî kişiyabûn ser dêman û di çol û beyarên Keleha Mezlûman de bi bejin û bala wê a çinarî re ha ha direqisîn. Keziyên şirtînî li xeleka newqa piştê sekinîbûn û di bin tîrêjên rokê de, mîna têlên qesebê dibiriqandin. Ev şahlewenda jinan, di eslê xwe de ne hovî bû, lê bûbû hovî. Du rehî bû. Reheke wê bulgarî û yek jî yûnanî bû. Ji tixmê derketiyên dema Sokulu Mehmet Paşa bû.
Piştî ku tibabekî meşiyan, ji nişkê ve dengê tîtetîtekê ji bahola yekî ji wan hat. Herçar jî di cihê xwe de sekinîn. Ê

li dawiyê hema bahol danî erdê, bêmefer vekir û li aparata xwe nerî. Aparat dişibiya seeta avê. Piştî ku çarmêrkî rûnişt, bi zembereka aparatê girt û bada. Wî çiqasî bada, mîl jî ewqasî geriya û kire tîtetît. Bi kêf rahişt dûrbîna ku di baholê de bû. Dûrbîn ne wek van ên adetî bû. Bi guhik, kaplo û antên bû. Dûrbîn da ber çavên xwe û heta ku pişta wî giha erdê, li ezmên nerî. Wan ên din jî destên xwe dan ber çavên xwe û li ezmên nerîn. Kelkela germa havînê bû û ji leylanê pê ve tiştekî jî li ezmên xuyanî nedikir. Lê Moşê bi haweyê ku ezman tije tişt û mişt bûn kwîtand, çirûskên ku ji antênan diçûn hinekî qut kirin û rûniştkî xwe da ser hev. Piştî ku di bin çavan re baş li Serok Altaxus nerî, bi kêf rahişt defter û qelema xwe û çep û rast xêzik kişandin. Serok Altaxus xwe negirt:
”Çi bû? Xwedê xêr bike gidî” got û ber pê de lezand.
Moşê dengê wî nebir xwe. Tîtetîta aparatê bilindtir û çirûskên ku ji antênan jî diçûn zêdetir kirin û bi hevalê xwe
128
re peyivî:
”Corc, elktrotsunsît, sunsat, sunsot, sunît!”
Corc bi dengê wî re mîna keça ku ji dawetê dima:
“Çi, çi, çi?” got û bi yek tûşê re bahola xwe vekir.
Bi dan û stendina herduyan re agir ket Serok Altaxus:
”We em avis kirin, de ka tiştekî ji me re jî bibêjin heyran”, got û di navbera Corc û Moşê de çû û hat.
Moşê xwe ker kir, pel û rûpelên deftera xwe dan ber xêzikan û Corc jî bi aparata xwe lebikî. Dengê tîtetîta aparata wî ji dengê a Moşê bilindtir bû. Dû re bi lez dûrbîn ji

baholê derxist. Dûrbîna wî ji a Moşê bû. Dûrbîn jî mîna bahol û cilên li ser wan sor bûn. Corc çawa ku dûrbîn da ber çavên xwe û li ezmên nerî, ji kêfan re da zîtirkan, kwîtand û got û hey got:
”Elektrostatîk, elektrostabîl, elektromagnet, magnet, magnet!...”
Serok Altaxus bi Corc ve beziya:
“Ew tiştên ku tu dibêjî tiştin çawa ne? Ez dixwazim wan bibînim.”
Corc guh nedayê, çarmêrkî rûnişt û deftera xwe da ber xêzikan. Xêzikên ku wî dikişandin ji ên Moşê him pirtir û him jî qalindtir bûn.
Serok Altaxus xwe bi ser de tewand:
”Corc, yanî tu dibêjî wê tu qewet nikaribe nêzîkî min bibe, ha!”
Corc dîsa dengê wî nebir xwe, lê bêdeng jî nema:
”Moşê, baş lê binere. Di vê newalê de elektromanyetîka ekso + eksîp - dîvs = nortsays pir civiyaye.”
129
Serok Altaxus rimekê çeng bû:
”Yanî manyetîka di vir de, ewqasî xurt e û wê tu qewet nikaribe xwe bigihîne min, hûn vê dibêjin ne?”
Moşê bi deng got:
”Corc, rast e, wilo ye. Eksîp û nortsaysên li vir, tiştekî zêde zêde xurt in! Lê ax ku me karîbaya ew alav jî bi haweyekî peyde kiribana, wî çaxî jî Serok Altaxus dibû imperetorê temamê dinyayê.”
Serok Altaxus bi gotinên wî re keliya, fûriya û rijiya:

“Ew çi alav in? Ew bi çi haweyî tên zeftê? Heger bi qeweta jin û mêran be, ez ê temamê jin û mêrên kohiyan di rêya wan de feda bikim. Û na heger bi peran be…”
Corc gotina wî birî:
”Moşê, elektrotsunsîtên ku li vir gihane hev, heta bi fuzeyên radîokatîts jî li hewa disekinînin.”
Serok Altaxus da lotikan:
“Zû bibêjin bê mirov bi çi haweyî dikare wan alavan bi dest bixîne?”
Corc ji Moşê jî mezintir peyivî:
“Ez bawer nakim ku tu pozitron jî karibin xwe li ber anot û katotên li vê newalê bigrin. Elektrodînamîzma vir, fuzeyên herî bi qewet jî dipekîne. Ax ku me ew santrusays peyde kiribana.”
Serok Altaxus tam ji ser xwe çû; mîna marê di nav êgir de bêserûber bi vir de û wir de pekiya û bi dest û pê û lepan peyivî:
”Bibêjin, bibêjin! Ew alav heger bi pereyan bin, bizanibin ku ez ê temamê xezîneya xwe di wan de bidim. Û heger
130
xezîneya min têrê nekirê, ez ê çi mal û milkê kohiyên ku hene û heta bi welatê wan jî li ser bikim.”
Moşê bi haweyê ku ji Serok Altaxus re bibeje, bi Corc re peyivî:
”Bi qasî xezîneyeke dagirtî, ewqasî jî dibe ku pêwistî bi ordiyeke cesûr hebe. Ma ne wilo ye Corc?”
Serok Altaxus berê xwe da wî û gotina ku tu carî negotibû kir:

”Ne li Rohilata Navîn û ne jî li temamê dinyayê, ez bawer nakim ku mîna kohiyan miletekî ewqasî bi cesûr hebe! Îcar ji vî miletê ku ez wî li ser tiliya xwe dizîzikînim, ne ordiyekê, dikarim deh ordiyan jî çêbikim û berê wan bidim nav êgir. Û dolar jî ji xwe li ba min wek axê ne…”
Corc ruyê xwe kir wek simaqê û peyivî:
”Ew alav bi milyon dolarekî tê zeftê, lê”, got û bi hinc lingê xwe li erdê xist.
Serok Altaxus hema xwe çeng kir ber, bi milê wî girt hejand û kelecanî got:
”Lê çi? Ew lê çi bû? Heger lêya te milyon dolar be, ez ê du milyonan, sê milyonan, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh milyonan û heta…”
Corc bi haweyekî henûn gotina wî birî:
”Serokê mezin, em dizanin ku xezîneya te ji a dewleteke efrîqî dewlemendtir e. Bi pereyên te mirov dikare pêncî carî wan alavan bikire. Lê problem ne bi tenê pere ne, hinekî jî qewet jê re divê.”
Serok Altaxus vê carê jî bi pêxêla wî girt û hejand:
”Kes ji min bi qewettir tuneye!”
131
”Serokê herî mezin, xuya ye min xweşik neda fêhmkirin. Zimanê min qels e. Li xwendegehê min her tim ji derza zimên zeîf distend. Îcar asas a ku min dixwest bigota, ji bilî pereyan, di rêya bidestxistina wan alavan de gelek mirov jî dikarin bên kujtin.”
Serok Altaxus ew hinekî din hejand:
”Sed hezar mirov? Du sed, sê sed, çar sed, pênc sed

hezar mirov?” got û dewam kir:
“Heger pêwîstî bi kujtina milyonan hebe, ez ê wan jî amade bikim. Û heta heger bihayê alavan bi qirkirina miletê kohî be, ez ê wê jî bikim. Ma ne ji xwe gava ez mirim, welat û milet bi carekê ve dimre; lê gava milet bimre û ez bijîm, wî çaxî bi min re welat jî dijî û ez ê jî kohiyên tam bedew û sipehî biafirînim…”
Moşê ji cihê ku lê rawestiya bû dengê xwe li wan rakir:
”Temam, problem safî bû. Pere, insan hemû hene!”
Canana ku qederê lateke erd ji hersêyan dûr sekinîbû û ecêbmayî li wan temaşe dikir, bi haweyê ku li qonaxa waliyê Teksasê bû, bi naz û tinaz û çikçikî peyivî:
”Madem her tişt heye; û wilo xuya ye em ê bikaribin herçi tiştên ku ji me re pêwîst in bi dest bixin, îcar ez jî dibêjim ku em dikarin di berpala wî girikî de labîrenta xwe bikolin.”
Serok Altaxus bi dengê wê re her tişt ji bîra kiribû û devjihev lê guhdarî dikir.
”Çêkirina labîrentê jî karê te ye, xanima delal. Lê ka ji Serok Altaxus bipirse bê ew çi dibêje. Di dawiyê de ê ku tê de rûne, cenabê wî ye.”
132
Serok Altaxus nehişt ku Moşê dawiyê li xeberdana xwe bîne ”na, Canan xanim çêtir dizane”, got û ber pê de meşiya.
133
Labîrenta Şoreşê
Canana mîmar, Labîrenta Şoreşê mîna pramîtên Misrê,

di hindurê pênc mehan de qedand û teslîmî Serok Altaxus
kir. Di labîrentê de sih û du kesên biyanî xebitîn. Labîrent
bi qasî du kîlometreyan ji Keleha Mezlûman dûr di guherekê
de bû. Serok Altaxus bi destpêkirina kolana labîrentê
re guher herêmeke pir bi talûke li qelemê da, bi qasî kîlometreyekê
rê ji ser guherê birî û labîrenta xwe ji şêrgeleyan
veşart. Ji Keleha Mezlûman guherê xuya nedikir.
Di hindurê herpênc mehên kolana labîrentê de, Serok
Altaxus ji Çoloyê ku Mumtaz Remê bi êşkenceyê kujtibû û
di bîst rojekî de li zimanê hovî bûbû wek bilbil pê ve nehişt
ku şêrgeleyek jî nêzîkî guherê bibe. Ên ku nêzîk bûn, yazdeh
şêrgele bûn û heryazdeh jî bi destê Çolo hatin kujtin.
Sisê ji wan jin bûn. Ji bilî pênc kesên ku bêhemdî xwe
gihabûn sînor û hatibûn kujtin, ên din hemû jî bûbûn qurbanên
xwejibîriya xwe; li gora hesabê kevin çûbûn. Guher
ji aliyê bajarê Çamê ve dibû çolbira Keleha Mezlûman û
hemiyan jî wek her tim li çolbirê xistibûn û hatibûn Kelehê.
Labîrent li ser pênc tebeqeyan di bin erdê de ji pêncî û
sê odeyên ku bi dilpijokiyeke delal hatibûn çêkirin pêk
dihat. Ji odeya ku diçû tunelê yekser odeya pêşî xuya nedikir.
Piştî ku mirov deh metreyên tunelê derbas dikirin,
odeya pêşî, û her ku bi wir de diçû hinekî bi navber odeyên
din dihatin. Lê odeyekê jî li hev nedinerî. Labîrent mîna
qulên xilt û maran li hev digeriya. Pêş û paşê wê tune bû.
134
Deriyên odeyên ku bi elektronîkê dihatin girtin û vekirin,
bi dîwêr re dibûn yek. Mirov tu carî bi ser wan venedibû.
Ode çarçikî bûn. Bilindahî, dirêjî û firehiya wan yek bû. Li

ser du metreyan bûn. Mihendizan li ber her deriyekî robotek danîbûn û Serok Altaxus bi alîkariya wan robotan derbasî odeyan dibû. Di destpêkê de robot bi qasî ku bi Serok Altaxus re biwenisyana dipeyivîn. Lê piştî ku di wensekê de robotekî hin gotinên Serok Altaxus bi xwe nexweş anîn û xwe lê sil kir û Serok Altaxus jî robot pelixand, mihendizan zimanê robotan li van peyvan siwar kirin:
”Derî, ajan, ez, tu, ew, veke, veneke, bigre, negre, tune, heye, dijmin, cehş, hat, çû, êrîş, bireve, nereve, bisekine, nesekine, fêhm bike, guh nedê, guh bidê, weh, ha, hi, haho, hewarê, eeehew, razê tiştek tuneye, rabe hertişt heye” û hwd.
Robot bêyî ku bimeşiyana him nahtorî li Serok Altaxus dikirin û him jî deriyê odeyan jê re digirt û vedikirin. Ji bilî vê jî robotan, heta bi hezar kîlometreyekî a ku ji bo Serok Altaxus dibû xeter ji hev difesilandin; fuzeyên ku li ser qesda kujtina wî rabana, robotan wê ew ji cihê cih dîtibana û hemiyan bi hev re gotibana ”ajan haaat!” Û dû re jî li zengil û pêpîkan xistibana. Li gora ku Serok Altaxus ji Çolo re gotibû, mihendizan ji hezar kîlometreyî balafir û ji du hezar kîlometreyan jî fuze rakiribûn û berê wan dabûn labîrentê. Û robot jî di wê yeka han de gihabûn. Serok Altaxus ji mihendizan pir hez kiribû. Li gora wî mihendiz him sosyalîst bûn û him jî jê re bi karekî wilo mezin rabûbûn ku temamê emperyalîstên dinyayê bi hev re girtibana ser,
135
wê dîsa jî bi sax û selametî ji nav lepên wan xelas bûbaya.
Ji bilî tunela ku diçû hindurê labîrentê, tuneleke din

hebû ku asas a Serok Altaxus xelas kiribaya ji xwe ew bû. Tunelê ji aliyê çepê ve bi odeya pêşî re dest pê dikir û bi odeya dawî re diqediya. Li wir helawêjeke mezin hebû. Di helawêjê de qemyonek, di hindurê qemyonê de cîbek û di hindurê cîbê de jî piskilêtek hebû. Helawêj her tim sekinîbû. Dema ku robotan sinyala xeterê dabana, Serok Altaxus jî wê li qemyonê siwar hatibaya û berê xwe rast dabaya balafirgeha Çamê. Navbera Labîrenta Şoreşê û Çamê bi texsiyê li derdora seetekê dikişand. Îcar heger bi rê de tiştek hatibaya serê qemyonê, Serok Altaxus wê xwe avêtibaya cîbê, û heger tiştek bi cîbê hatibaya, vê carê jî bi piskilêtê wê xwe gihandibaya qonaxa xwe. Qemyon û cîb yekser ji polayê bûn. Sîwana ku piskilêt ji êrîşên bejayî û hewayî diparast jî ji polayê bû. Mihendizan bi Serok Altaxus re li ser ku çima ne motorskilêt, lê piskilêt? çend seetekî dan hev. Li gora Serok Altaxus êrîşên eskerî bi giştî seet li derdora duduyên şevê dibûn û di wê seetê de reva bi motorskiletê jî deng vedida. Mihendizan ji bo bêdengiyê, motorskilet qulipandin ser elektronkê jî. Lê Serok Altaxus ew yeka han jî qebûl nekir. Di dawiyê de Cananê tê derxist ku mêrik nizanîbû motorskilet biajotaya; dest avêt mijarê û bi piskilêtê dawî li devjenga wan anî.

Li ser haweyê xebitandina terempêlan jî li hev germ kirin. Li gora Serok Altaxus dema ku terempêl bi elektronîkê bêdeng meşiyabana, terempêlan bal dikişandin ser xwe û ew didan dest. Mafir Cananê ew jî safî kir. Hevalên wê

136

qemyon û cîb li ser benzînê pev xistin.

Mihendizan ji Serok Altaxus re tiştekî din jî kirin. Hindurê labîrenta wî û bi taybetî jî odeya wî a rûniştinê û razanê bi kamereyên piçûk û mezin xemilandin. Ji kolana labîrentê pirtir asas pereyê wî ê mezin li van kamereyan çû. Ji hew bêhtir kêfa wî dihat ku di wan re li her derê Kelehê dinerî û li şêrgeleyan guhdarî dikir. Pir li ber mihendizan geriya ku temamê çiyayên Kohistanê jî bi wî teknîkî raxin. Mihendizan pêşî xwe nedan ber. Lê piştî ku Serok Altaxus xwe avêt Cananê û li gora ku wî digot jinik li himberî mihendizan bi deh milyon dolaran bi kar anî, mihendizan bi sê milyar dolaran xwe dan ber ”projeya çiyayên bi manyetîk û kamera.” Ew jî bi sergiranî. Heger Serok Altaxus nîv milyar dolar pêşin nexista destê wan û ê din jî di hindurê kar û xebata wan de hin bi hin nedabaya, mihendiz bi projeyê ranedibûn.

Herdu aliyan piştî ku bi hemû haweyî li hev kirin, xwe tam dan projeyê. Mihendiz bi şirketên mezin re û Serok Altaxus jî bi şêrgeleyên xwe ên çiyan re têkilî xweş û bêş kirin. Mihendizan di hindurê du hefteyan de sê odeyên labîrentê ji alavên kompîteran, sêlikên satalîtan, telefonên mobîl, risas, lihîm, macûn û kaployên rengareng dagirtin. Odeyek jî ji mûçing û kubasên bafûnî, pense û kelbetanên qulqulî tije kirin. Di wê navê re Serok Altaxus jî li çiyan dîsa şer sekinand û ala aşitiyê li ba kir. Lê hoviyên ku ew bi pîvazekê jî nedihesibandin, dîsa wek her tim guh nedanê û ji berê dijwartir kişiyan ser şêrgeleyên wî. Serok Altaxus di vê carê de tam bi biryar bû. Digel ku bi sedan şêr-

geleyên wî hatin girtin û kujtin, dîsa jî li gotina xwe nequlipî û şer û aşitî yekalî bir. Yekalî bir lê eskerên hoviyan jî cilik di bin şêrgeleyên wî de nehiştin û bi ser de jî qira wan anîn. Heger Serok Altaxus bi a mihendizan nekiribaya û çiya ji şêrgeleyan vala nekiribana, kî dizane belkî şêrgeleyek wî jî sax nemabaya. Lê piştî ku şêrgeleyan cumhûriyetên xwe ên li çiyan ji hev belav kirin û berê xwe dan başûrê Kohistanê, vê carê jî esker kişiyan çiyan û karê mihendizan dîsa li erdê ma. Di dawiyê de Serok Altaxus nîv milyar dolarên din jî da wan û kar û barê projeya ku pê rabûbûn li bendî hetanî ku çiya ji eskeran xalî bûbana re hiştin.
Bi çûna mihendizan re Serok Altaxus hema navê partiya xwe kir Partiya Sosyalîstên Sînornenas, dev ji xelasiya bakurê Kohistanê berda û vê carê jî bi xelaskirina başûrê Kohistanê daket. Herêma başûr ji bo xwe pir girîng didît. Li wir kohî hêdî bi hêdî ber bi azadiyê ve diçûn û çavên hemiyan li ser wir bû. Azadiyê rê li ber xwefiroşiyê û dîktatoriyê digirt. Li cîhê ku azadî heba jîr û zanahî û jiyaneke bi rûmet hebû. Azadî dijminê xizaniyê, hêsîrî û belengaziyê bû. Insan bi şexsiyeta xwe dihat holê û şexsiyet jî bi azadiyê li ser pêyan disekinî. Û birêvebirên xelkê başûrê Kohistanê jî hemû hov, kawikî, beredayî, dîktator û xwefiroş bûn.
Serok Altaxus bi şêrgeleyên xwe re wilo peyivî û berê wan da wir. Di wê demê de li wir jî sê tiştên wek sê dewletan çêbûbûn. Him dewlet bûn û him jî ne dewlet bûn. Li ser wê yekê gelek pisporên dewletên dinyayê li wir civiyabûn û li dora salekê temamê ilmê xwe bi kar anîbûn da li gora wê

rewşê navek ji wan tiştên ku wek dewletan bûn peyde kiribana. Digel ku hemiyan jî serê xwe pir pê êşandibûn tiştek bi ser tiştekî nexistibûn, di dawîyê de hemiyan jî pişta stuyê xwe xurandibûn û vegeriyabûn welatên xwe. Lêbelê tiştê ku pispor lê geriyabûn, xelkê ji zû de dîtibû. Ji hersê tiştan re gotibûn ”Dewletên bêserûqûn!”

Her hêzekê navê dewleta xwe kiribû ”Komar.” Û Komar jî bêserok bû. Hikûmet hebû û biryarên hikûmetê jî serokên partiyan didan. Wezîr wek eskeran û serokwezîr jî wek komutanên wan tevdigeriyan. Karê serokwezîran ewqasî pir bû ku pê re nedigihan rîha xwe kur kiribana. Serokwezîr ji postexaneyan û hetanî ku digiha çapxaneyên herî piçûk, bi hemû karî mijil dibûn. Serokwezîr bi qasî ku kitêba herî bêqîmet jî bêyî raya wan çap nebûna bi disiplîn tevdigeriyan. Ala wan bi tenê di hindurê malan de bi dîwaran ve daliqandîbû. Ew jî ne her tim. Gava her ji çendeyekî dewletekê ji wan, bi sebeba ku devê dewleta din biçiranda, generalên çolî, hovî û sofî dawetî malên xwe dikirin, ala xwe ji dîwaran dadixistin û vedişartin. Televîzyon û radyo ji bo şer û pevçûnan bi kar dianîn. Sipîker fermandarên bêrutbe bûn. Fermandarên bi rutbe di televîzyon û radyoyan de bi xeberan mîna kewan radihiştin hev. Ên bêrutbe hîn bêhtir xeberokî bûn. Rê nedidan dengbêjên ku ne alîgir bana. Nivîskarên ku li ser camêriya fermandaran kitêb nedinivîsandin, birçî û tazî digeriyan. Lê nivîskarên ku zilamtiya kasorên partiya dipesinandin, ji ên ku fermandar û serokhêz dipesinandin bêhtir bi pere bûn. Bi tenê hew nivîskarek ji pesindanê reviyabû û ew jî li parsê hesilîbû.

139
Du nivîskarên girtî jî hebûn. Digel ku berpirsyarên rojnameyan fermandar bûn, di redaksyonan de jî cih digirtin.
Esker û polîsên wan li hin deran bi rutbe û li hin deran jî bêrutbe bûn. Mehkeme jî hebûn, lê li gora ku digotin yek ji wan mehkemeyan jî ne li ber tiştekî bû. Dema ku gundiyan li ser hoxeke erdê beyaran li hev dixistin, esker û polîsên vî alî û wî alî jî diketin nav hev û qira hev dianîn. Carekê li bajarê Selmanê du zebzefiroşan li ser tivir û şelimên ku bi qaçaxî ji bajarê Duhbanê anîbûn, pevçûbûn û hevdu biribûn mehkemeyê. Mehkemeyê jî yek ji wan wek casûsekî dewleta herêma Botînanê dît û cezeyekî pir giran dayê. Li gora ku dihat gotin heger mehkeme bi ebûkatbaya, belkî mêrik cezayekî ewqasî giran nexwaribaya. Mehkemeyê ew li rajorî bajêr berdabû hindurê lûla topa fitarê û agir pê ve danîbû.
Serok Altaxusê ku henekên xwe bi aqilê serek, mehkeme û temamê sazî û rêxistinên başûrê Kohistanê dikir û di avakirina cumhûriyetan de deng dabû, li ser ku şêrgeleyên wî bi nan û zikê wan deran biparêzin, bi serekên xelkê başûr re li hev hat û li ser daxwaziya serekan ji wan re hema dest bi avakirina cumhûriyeteke mezin kir. Lê piştî ku di hindurê mehekê de cumhûriyeta wan qedand, vê carê jî lê bû zor û tev li xelkê ku girêdayî serekan bûn dest danî ser her tiştê cumhûriyetê. Heger Serok Altaxus sînorê cumhûriyeta xwe nebira hetanî bi nav bexçeyên Duhbanê û ji wî alî ve jî dîwarê sînorê xwe li aşxaneya Babekanê ku di nîvê sûka Selmanê de bû, dibû ku serekên xelkê başûr dîsa

dengê xwe nekiribana. Karê vî Serok Altaxusî wilo li dijmi-
140
nên xwe dikir. Gava ku nuh dest avêtibû xebatê jî wilo kiribû.
Dinyayek pere ji general û şêfên polîsên hoviyan stendibû.
Piştî ku bi wan peran qeweta xwe dabû ser hev, vê
carê jî li general û şêfan vegeriyabû û ew şerpeze kiribûn.
Wî bi xwe digot û dinivîsand. Li Bintêlê jî dîsa bi karekî
wilo rabûbû. Hetanî ku li wir tam nehatibû ser derba xwe,
bi serekên partî û rêxistinên herêmê re pir baş meşiyabû. Lê
piştî ku gihabû a xwe û li gir fitilîbû, bi hin serekan re şêwira
kujtina hin serekên din gerandibû. Û piştî ku ew ji ber
xwe kiribûn, vê carê jî li van ên din vegerîyabû û ew jî bi
metodên xwe ji holê rakiribûn. Bintêl bi xwe hiştibû.
Serok Altaxus piştî ku li başûrê Kohistanê cihê şêrgeleyên
xwe tam asê kir û lingên birêvebirên xelkê başûr ji hew
bêhtir xistin zikê wan, têkiliyên xwe ên bi şêrgeleyan re
hêdî bi hêdî kêm kirin, bi teknîka ku labîrenta xwe pê raxistibû
daket û bi Çolo re li ber kamereyan çong berdan erdê.
Li akademiyan jî nema derz da. Ew karê xwe carcarê bi rêya
telefonan meşand. Ji heftê carekê diçû ber behra Zîqê û
Termûsê û kêfa belek dikir. Dev ji wê kêfê jî berda. Rojnameger,
parlamenter û burokratên ku ji gelek welatan bi hisreta
dîtina wî dihatin hetanî bi Keleha Mezlûman ber lingên
wî, bi rêya telefon û nameyan bersivên xwe stendin û
polî poşman li welatê xwe vegeriyan.
Serok Altaxus bi rêya kamereyan giraniya xwe berda ser
îdeologên partiyê; hema hema her roj dan û stendin û
xeberdanên wan li ba xwe qeyd kirin û hin xeberdanên wan

ên ku li hesabê wî nehatin, bi rêya hoperlorên ku li gelek derên kelehê bi cih kiribûn da ruyê wan. Îdeolog jî behetî

141

man. Lê piştî ku li akademiyan çend carekî bi wan re rûnişt û li ser haweyê razana wan, li ser zik radizan, xwarin û vexwarin û tevgera wan ew bêerz kirin, îdeolog tam hebitîn; bi çavekî xwedayî lê nerîn û bi hemû haweyî stuyê xwe li ber xwar kirin. Di wê navê re çend îdeologên ku jê ketin şikê, ew jî bi marîfetên xwe ji holê rakirin û li afirandina cîlekî ku hebûn û nebûna xwe di wî de dîtibana geriya. Di wî warî de serê xwe pir êşand. Bi şev û rojan li wî metodî fikirî û bi sedan rûpelên kitêban li hev qulipandin. Li metod rast nehat. Û heger ne ji hewesa wî a flîmên zarokan baya, belkî jî qet li wî metodî rast nehatibaya. Kêfa wî pir ji flîmên kartonî re dihat û di televîzyona partiyê de jî flîmekî ezmanî xelek bi xelek nuh dest pê kiribû. Di flîm de du qebîleyên ezmanî bi hev re şer dikirin û ji bilî serekan her kes bi kod bû. Serok Altaxus di bin bandora flîm de li rakirina navên şêrgeleyan fikirî û di metematîkê de rola yek û sifrê da ber hev:

”Di nav hejmaran de hejmara herî piçûk, yek e. Sifir bi serê xwe ne tiştek e û yek jî tiştekî ku di binya sifirê re tiştek e. Yek tiştek e, sifir ne tiştek e û sifir ji yekê bi hêztir e. Yek bi sifirê dibe 10. Sifir qeweta neh tiştan li yekê siwar dike. Yek bi du sifiran dibe100, bi sê sifran dibe 1000, bi çar sifran dibe 10.000, bi pênc sifran dibe 100.000”, got û heta ku serpiştkî li erdê rast bû keniya.

Piştî ku bêhna wî hat ber wî, bi hêl rabû ser xwe, herdu

destên xwe bi hev re hejandin û heta ku jê hat bi deng got:
”Kesek ji min xurttir tune yeee!”
Li Çolo nerî. Çolo jî mîna hespê qaçaxê guhmiçî lê
142
dinerî. Hazirê revêbû. Serok Altaxus di rewşên wilo de
gelek caran her çi tiştê ku ketibû ber destê wî têwerkiribû.
Çend carekî jî kêr avêtibûnê. Kêr hemû lê ketibûn. Lê asas
bi kêra ku li xavika zik ketibû êşiyabû. Kêrê bi qasî movikekê
zik çirandibû.
”Ez yek im û ew jî sifr e. Sifir her sifir e, yek nabe dudu,
lê dudu dibe çar.
Sifir bi duduyan yekê têk dibe. Yeka bêsifir her yek e û
dudu jî bi sifrê bîst e.”
Sekinî û hilmekê bala xwe da ser Çolo.
“Ê ne ez ê nehêlim ku hûn tu carî bibin yek û dudu”,
di ber xwe de got û bi qelem û defteran ve beziya.
Pêşî ji koda Çolo destpê kir û jê re got:
”Ji niha û pê ve êdî navê te 01 e. Û navê Dimdim jî
bila 00 be.”
Serok Altaxusê ku ji bilî navên îdeologan, temamê
navan qedexe kir û di şûna her navî de kodek bi kar anî,
di labîrenta xwe de bi Çolo re heta şeva ku bi çewtî pê li
pişkokekê nekir jî, bêxem raza. Lê çi bû hemû piştî wê
bêqidoşiyê bû. Pê li pişkoka ”derî veneke” kir û bêyî ku
dîsa pê lê kiribayê vê carê jî pê li pişkoka ”derî veke” kir.
Robot jî got ”derî tune!”
”Derî tune çawa yaho, ev tu çi dibêjî?” got û vê carê jî
bi hev re pê li çar pişkokan kir.

Robot dengê xwe lê rakir û sivik sivik peyivî:
”Tune derî, derî, derî, tune, tune!...”
Herduyan tibabekî li ber hev dan û yek ji wan jî ji ser
a xwe nehat xwarê. Di dawiyê de Serok Altaxus ji canel-
143
ametî zora xwe bi kar anî:
”Kûçik, ma tu jî ajan î?” got û heta ku jê hat şiqamek
li ruyê wî xist.
Robot jî mîna mirovekî tengijî, serê xwe lê hejand û bi
qîjewîj got:
”Ez venakim, fêhm bike, derî tune, weh!”
Serok Altaxus ne jê fêhm kir û ne jî ji ser vekişiya; çep
û rast ew da ber şiqaman:
”Derî veke, veke, veke!...”
Bi şiqamên wî re vê carê jî robot xwe kil kir, lempeya
xwe a sor pêxist, lempe di serî de bû, û ha ha got:
”Ajan! Îspiyoncî! Tîm! Îşbîrlîkçî!...”
Serok Altaxus tam kethev û ew da ber şeg û pegan.
Heger mihendizan ji cihê cih robot neanîbana sêhra berê û
derî jê re venekiribana, bi wan elektronîkan wê dawiya xwe
bianiya.
Îcar piştî ku robot teslîm bû û got ”derî vebû, biçe”,
mêrik mîna gulekê vebû û bi robot keniya:
”Hey yaya gidî kewaşe, ka te digot derî tuneye, ne va ye
heye zirto(!)”
Serok Altaxus piştî vê bûyerê êdî bi rastî bawerî pê anî
ku insan û heywan û heta temamê ruhberan, bi lêdanê
dikarin hedayet bibin û bi wê mebestê li gora exlaqê xwe

teoriyeke êşkenceyê afirand.
144
145
BEŞÊ SISÊYAN
”Pêşî bi şik li dirustiya xwe û dû re jî li a hevalê xwe binere!”
Serok Altaxus
146
Serok Altaxus şibiya mirovê herî pêşî
Serok Altaxus di hindurê salekê de şibiya mirovê herî pêşî. Ji xwe wilo jî difikirî. Ji ber wê yekê jî dev ji kurkirina rîhê, por û simbêlan berdabû. Dareke pirtiqalî, dar naylonî bû, anîbû odeya xwe a rûniştinê, carcarê xwe di bin de vediziland û sêvên sor dixwarin. Lê digel wî haweyî dîsa jî ji alîgirên partiyê û şêrgeleyan pir ditirsiya. Kujtin û êşkenceya herî xerab hîn jî ji bayê xwe neketibû. Di rojekê tenê de li ser gotina lawikekî çar-pênc salî sê îdelogên xwe dan kujtin. Ji îdeologan yek jê berê li akademiyê bû û herduyên din jî nuh ji çiyê û deverên wekî din hatibûn. Lawik sêwî bû û ji gelek tiştên zarokî mehrûm mabû. Û bi ser de jî hîn bûbû ku Serok Altaxus him bavê wî û him jî bavê temamê insên e. Dema ku Serok Altaxus derketibû teftîşê, lawik jî hilkişiyabû ser dika akademiyê û ha ha jê re gotibû ”baba, serok, pîs e, xayin e, heval, dikuje!”
Serok Altaxus di labîrenta xwe de bi ser hev de tewiyabû. Tenduristiya wî baş xerab bûbû. Mêrik ji xwe hema hema her tim bi bapêşê bû û bi ser de jî sînozîtê dabû ser. Êşa serî xwe berdabû ser mejiyê wî, li damarên çavan

geriyabû û çavên wî bi qasî ku sêv û hinar ji hev nefesilandana nuqsan bûbûn. Her gavê serêşî bû. Xur jî ketibû canê wî. Di laşê wî de çend kew jî çêbûbûn. Lê kewa di kulîmeka wî a çepê de mirov ditirsand. Bîrov jî ketibû nav tilîkên wî ên lingan. Tenduristiya wî ji hew bêhtir xerab bûbû û hedan jî nediket canê wî. Li gora wî miletê kohî ne tiştek derketibû, şêrgele pê re xayin ketibûn, ajanan partî li hev

147

pişk kiribûn û barê sosyalîzma cîhanî û heta a herêmî jî bi carekê ve qulipîbû ser pişta wî. Ji ber wê yekê bû ku bêwestan bi rêya televîzyonê, radyo û telefonan bi xelkê û şêrgeleyan re dipeyivî û rêya xelasiyê dida ber wan.

Serok Altaxus bêsekin tevdigeriya. Di her odeyeke labîrenta wî de sê telefon û televîzyonek hebû û bêyî ku raba ser xwe, bi kursiyê xwe ve mîna marê teyar ji vê telefonê ber bi telefona din ve disûrikî û ha ha ev û ew û ê din bêerz dikirin. Lê her çi bêerzkirina wî bû jî ji bal her kesî ve wek şîretê dihat qebûl kirin. Xawrin pir dixwar. Berê jî pir dixwar, lê ne ewqasî xure bû. Xurebûna ku lê peyde bûbû jî hemû ji destê şêrgeleyên wî bû. Ji wan hêrs dibû, bi wan re dixeyidî û êrîşî ser xwarinê dikir. Fêkî kêm û goşt jî zêde dixwar. Ji fêkiyan bi tenê kêfa wî ji hinaran re dihat. Dema ku hinar bi dest diketin, li yek tûşê tebekek hiltanî. Di vê dawiyê de kêfa xwe ji sêvan re jî anîbû, lê pir hindik dixwarin. Serok Altaxus di labîrenta xwe de ji berê bêhntengtir bûbû. Piraniya bêhntengiya wî jî hemû ji ber xeberdana wî a bi telefonan bû. Piştî her xeberdanê hinavên wî disincirîn, serê wî dizingirî û canê wî yekser diwestiya. Ji ber telefonan

herdu guhên wî jî her tim sor û mor û qeşirî bûn.
Wext nedidît ku xwarina xwe bi serekî rihet xwaribaya. Di
xwe re nedigiha ku avek bi ser canê xwe de dakiriba, yan
serê xwe erebkî şûştibaya. Bi hisreta bedlekî hovî û qundreyeke
çolî bû ku bi wan li Keleha Mezlûman di nav heval
û hogirên xwe de rûniştibaya. Bîst û çar seetan bi bêceme
û şimik bû. Gava radiza jî bi şimik bû. Şimik di lingên xwe
148
de ji bîr dikir.
Serok Altaxus dev ji xwendinê jî berdabû. Di eslê xwe
de mêrik berê jî ne yekî ku kêfa wî ewqasî ji xwendinê re
dihat. Navê dinyayek kitêbên edebî û zanistî derbasî kompîtera
xwe kiribûn û bi haweyê ku hemû xwendibûn bi vî
û wî re dipeyivî. Bi Çolo re ferhenga nivîskar, artîst, muzesyen
û şanogerên ku di dinyayê de xuyayî bûn jî çêkiribû.
Lêbelê Çolo hindik mabû ku li ser wî karê xwe hatibaya
kujtin. Çolo Madona wek melezeke ûgandî nivîsandibû û
wî jî di televizyonê de ew wilo bi nav kiribû.
Serok Altaxus di salên xwendekariya xwe a fakulteyê de
hinekî bi rêk û pêk xwendibû. Lê asasê qeymaxê mejiyê xwe
û rengê xebata xwe di herdu-sê mehên ku li Hovistanê ketibû
girtîgehê de girtibû. Digel ku kitêb û rojname hîç nedixwendin,
pir dinivîsand. Nivîsên wî jî bi giştî fermanname
û teoriyên di derbarê felaketa ramûsanan û destavêtinan de
bûn. Şêrgeleyên mê û nêr bi çûna wî a labîrentê re li hev
sincirandibûn û li her cihê ku keys lê dianîn xwe di hev
werdikirin. Serok Altaxus jî hema hema dev ji temamê tez
û sentezên xwe ên li ser şer, kujtin û êşkenceyê berda û ji

fermanname û teoriyên ku di kûra eşqa şehwetê re derbasî patîkeyên beyaran dibû û pê ve tiştekî din nedinivîsand. Bi nivîsandina fermannameyan û teoriyan heyirî mabû. Dinivîsand, diqetand û diavêt tenekeya çopê; û çawa ku diavêt çopê wilo jî lê vedigeriya, ji a berê xerabtir dinivîsand û dida destê Çolo. Bi tenê hema li Keleha Mezlûman di hindurê çar-pênc mehan de bi dehan keçên avis hatin kujtin.
Gelek keç û xort jî ji vir û wir reviyan û ji bêgavî xwe tes-
149
lîmî eskerên hoviyan kirin. Eskeran jî piştî ku ew bi def û zirneyan bi hev re dizewicandin, berê wan didan hevalên wan ên kevin û ew bi hev didan kujtin. Di hemû operasyonan de bi eskeran re bûn. Û heta bi destê wan gelek mirovên xuyayî jî dihatin kujtin.
Serok Altaxus di labîrenta xwe de hetanî ku seroka Mehkemeya Şoreşê dîn û har nebûbû jî hinekî bêxem radiza. Lê piştî ku Sevgî Hanimê cilên xwe qetandin û şilfî tazî geriya û şêrgeleyan jî ew birin Hovistanê ser doktoran, xewa wî bi carekê ve hat guhertin û xulqê wî ê ku mabû jî çû.
Şevên wî bi kabûsan derbas dibûn. Xewnên giran didîtin û bi qîr û nalîn ji nav livînan çeng dibû; xwe diavêt himbêza Çolo û tiştên ku di xewnê de dîtibûn yek bi yek jê re bi dar ve dikirin. Çolo jî bi sibehkî re diçû ling hersê psîkologên ku di vê dawiyê de ji bo ravekirina van xewnan li Keleha Mezlûman bi cih bûbûn û mîna ku xewn wî dîtibûn ji psîkologan re digot:
”Min şevê din pê li peqpeqonkeke baranê dikir, peqpeqonk

di bin lingê min de dibû derya û ez jî di nav de
dibûm gamasî. Ew xewneke wilo xweş bû ku tiştek jê xweştir
tune bû. Lê piştî ku min di nav wê ava zelal û ewqasî
paqij de dimîzt, av hema pê re genî dibû û ji her derê
deryayê ve zîro, kurm û marên wek werîsan dirêj xwe dadidan
min."
Psîkologan jî hema di cih de şerha xewnê nedikirin; piştî
ku li dora seetekê bi tenê li hev rûdiniştin, bi yek devî şerha
dawî jê re dikirin û digotin:
150
"Baran bereket e. Av jîn e. Mar dijmin e. Zîro ajan e.
Û kurm jî altaxê malê ye…"
Geh temamê insanên dinyayê dikirin esker û xwe jî
dikir komutan; esker dixistin balafirên ku ji fuze û saroxan
çikçikandî bûn, balafir bi hewa dixistin û bêyî ku li tiştekî
siwar hatibaya, şûrê xwe dikişand û li ezmên bi balafiran re
habela şer dikir. Bi xewnên xwe re heta sibehê belkî 20-30
carî şiyar dibû û radiza û dîsa eynî xewn didît. Bi belavkirina
balafiran re dihelikî. Heta sibehê şûr dihejand. Heger
di xewê de bi qîjewîj nepeyivya belkî hinek rewa di canê wî
de mabaya û ewqasî ji derb neketibaya. Psîkologan xewnên
wî ên ku bi balafiran re şer dikir, bi qelseya şêrgeleyên wî
ên li başûrê Kohistanê ve girêdidan û dibûn sebebê ku
Serok Altaxus ser wan tije sîlehên giran kiribana.
Carina dibû pêxember. Carina xwe ji Îsa jî mezintir
dikir û dixwest bûba ew tiştê ku ji wan mezintir bû. Lê
dikir û nedikir li navê wî rast nedihat. Di xewê de hîç nedibû
Xwedê. Ji êgir nefret dikir. Her şev dida nav şîr û avê;

şîr û av li xwe dikir agir û xwe bi saxî dişewitand. Ev
xewnên wî ên wilo, Çolo ji beleyeke mezin xelas kiribûn.
Her tim bi demaçe bû û çend carekî jî çend fîşek li ser kiribûn.
Psîkologan piştî wan xewnan her tiştê ku bi barûdê
dixebitî ji labîrentê bi dûr xistibûn.
Carina şêrgeleyên wî ên jin, li pêş çavên wî bi şêrgeleyên
mêr re rûdiniştin; ew maçî dikirin û bi rebeniya wî dikeniyan.
Lê piştî ku bi xwe şiyar dibû, heyfa xwe jî pir giran
ji wan hiltanî. Li ser wan xewnan nozdeh keç kujtibûn, lê
kujtina yekê ji wan jî ne wek a ku bi qoda 015an bû. Keçik
151
bi saxî şewitandibû!
Kujtina nûnerê wî ê Kafkasyayê jî dîsa ji ber wan
xewnan bû. Di xewê de pê re ketibû têkiliyê û digot:
”059 tu li kîjan cehnemê yî, deng ji te nayê?”
Nûnerê ku li ser gotina wî çûbû Polonyayê jî digot:
”Serokê min, ez aniha li Varşovayê me.”
”Çi, çi, çi?..”
”Belê Serokê min, ez li Varşovayê me, Varşova.”
”Îcar ev tu li Varşîntonê li çî xwe digerî deyûz! Tu çûyî
raporan bidî CÎAyê, ha”, got û telefon di ruyê wî de girt.
Piştî ku ji xewê şiyar bû, ji nûner kete şikê û bi xeberên
kotî ew da ber hev. Di dawiyê de xwe negirt û ew di hindurê
çar rojan de anî akademiyê. Nûner mehkeme nekir.
Çolo ew jî ji hev çirand, kir du tîş û avêt ser Moristana
Şoreşê.
Devê Serok Altaxus di xewê de nediket hev. Di eslê xwe
de gava şiyar bû jî wilo bû. Bi qasî ku alimên mintehî li

himber gotinên wî xwe negirtibana, çort dipeyivî. Di binê pênc tebeqeyan de xwe di cihê herî bi star de vedişart û dîsa jî bi şev û rojê saw ji xwe re çê dikir. Labîrenta wî bi carekê ve kilskirî bû û her tim jî ampûl pêketî bûn. Fêhm kiribû ku çavên wî ji ber wê ronahiyê diêşiyan û hêsir dikirin. Dixwest ku di bîst û çar seetan de pênc-şeş seetekî li reşê jiya ba, lê ceger nedikir. Digel ku qelewbûyina xwe, nepxa lingan û bayê di zikê xwe de bi rûniştinê ve girêdabû, dîsa jî dev ji aparata telefonan bernedida. Cihderka bêhntengî û nerehetiya xwe jî hinekî fêhm kiribû. Sebebê wê yeka han çekdar didîtin. Sibehan nehişî, tengijî, westyayî û keslan ji

152

xewê radibû. Her sibeh çavên wî bi şelêq bûn. Ji birebira di xewê de kefinca ku di dev re diavêt, bi qurmê simbêlan ve tûk digirt. Taştê nedixwar. Di bin tesîra xewnan de heta ku lê dibû nîvro û firavîn jê re dihat, herwiha vezilandî telefonî vir û wir dikir.

153

Serok Altaxus bû mirovê herî mezin

Serok Altaxus piştî ku di bin tesîra xewnan de bayê êşkenceyê û kujtinê gur kir û bi wî bayî re jî partî ji berê xurttir bû, vê carê jî berê xwe tam da şêrgeleyên xwe ên li her derê û heta ku ji destên wî hat repand wan. Lêbelê wî çiqasî bi lêdanê, kujtin û pîskirinê repand wan û koka şêrgeleyên xwe ên bi ceger û zana anî, miletê kohî û şoreşger û ronakbîrên hovî, çolî û sofî jî ewqasî jê hez kirin û li dora wî kom bûn.

Di hindurê çar-pênc mehekî de Serok Altaxus, partî

yekser ji dest şêrgeleyên kevnare derxist û bi carekê ve xist dest gelşê ku ji naşiyên kawikî, zirz û zirzop pêk dihatin. Îcar çawa ku nûner û birêvebirên kawikî û naşî bi karê xwe rabûn, partî jî mîna şîrê li ser êgir fûriya û di Rohilata Navîn de bû partiya herî mezin. Ji bilî xewnravêjên psîkolog, temamê hogir û dostên partiyê û heta Serok Altaxus bi xwe jî li wê yeka han ecêbmayî mabû. Carcarê bi Çolo re dikeniya û digot:

”Li ser ruyê vê dinyayê ji kohiyan beredayîtir milet tune ne. Kuro ev wek kulbeşkê ne, ez çiqasî li wan dixim û wan bêerz dikim, ew jî ewqasî hilfa xwe didin ser min û bi lêdana min qelew dibin!”

Serok Altaxusê ku li gora aqilmend û ronakbîrên kohiyan her tim xerab dikir û bi qeweta xerabiya xwe jî temamê kohiyên dinyayê li xwe civandibûn, bi berpirsyar û nûnerên xwe ên ku li ser serê saziyan datanîn mabû heyirî. Li gora wî berpirsyar û nûner heq ji karê xwe dernediketin û

154

şoreş kulfiskî bi rê ve diçû. Digel ku bi metodên xwe ên herî dijwar bi wan dadiket û heta ji heft-heşt rojan û carina jî di hindurê çend seetekî de berpirsyar û nûnerek datanî û yek din radikir û dîsa jî wek wî nedibû, ji bêgavî dîsa gazî mihendizan kir û labîrenta xwe bi hemû aparatên ku li Nasayê hebûn xemiland. Dû re jî her berpirsyar û nûnerên tiştekî xwe telefoneke mobîl da dest û bi temamê kar û barê şoreşê rabû.

Di aparata ku mihendizan di ber dinyayek dolar de jê re pevxistibûn, li dora neh hezarekî pişkok hebûn û Serok

Altaxus jî bi rêya wan pişkokan li temamê şêrgeleyên xwe hikim dikir. Di destpêkê de kar baş çû, lê piştî demeke kurt her pişkokekê li gora cihê xwe serêşiyek dayê, pişkok tev li hev kirin û karê şoreşê di nav destên wî de mîna rês li hev geriya. Carekê hindik mabû ku ji wehca nava xwe bi tisqayê ketibaya. Ji nûnera Jinên Kemlan hêrs bûbû û dixwest ku ew bêerz kiribaya. Îcar bi şaşî çima pê li pişkoka nûnerê Mêrên Dijwar neke! Di televîzyonê de bi ser de hilbûbû û jê re digot ”lan hanim efendî!...”

Mêrik jî têriyekî tam ji xwe razî bû. Simbêlên wî li pişta guhên wî diketin û bi ser de jî baş pê dizanîbû bê ‘hanim efendî’ çi bû. Ew bêminet kir; kaplo maployên studyoyê hemû qetandin û her kes da ber şeg û pegan. Serok Altaxus jî ji serhildana wî xwîn bi xwe ve dît, keribî, geft lê xwarin û mîna hêlanê çû û hat. Heger şêrgeleyan di wê şevê de mêrik bi êşkenceyê nekujtibana û ax û hewarên wî di guhên Serok Altaxus de deng venedabana, Serok Altaxus wê bûba yamyam û ji xwe û Çolo yek xwaribaya. Dîn û har

155

bûbû û bi gezan êrîşî canê xwe û Çolo dikir.

Serê wî bi berpirsyar û nûnerên wî ên li Ewrupayê û bi taybetî jî bi ên li Elemanyayê re tam ketibû belayê. Berpirsyar û nûner xerabe bûn û ew di nav ewrupiyan de habela piçûk dixistin. Di eslê xwe de heger ne ji nûnerên wî ê akademiya zimên û edebiyata kohî û serokên parlamento û meclisa wî a li Ewrupayê bana, belkî çerxa şoreşê di nav elemanan de jî xweş geriyaba û Serok Altaxus di Ewrupayê de bûba mirovê herî mezin. Lê çi fêde nûner û serokên wî ên

ku her hefte dihatin guherandin, bi kultura li ber pez û dewaran mezin bûbûn û ewrupiyan jî ji zarê wê kulturê fêhm nedikirin. Her nûnerê dema ku dest bi karê xwe dikir, di derbarê ziman û edebiyata kohî de bi zimanê hovî pêşî konferansek li dar dixist û li ser navê Serok Altaxus bangî ewrupiyên akademîker dikirin. Nûner jî her tim ya şivan û ya jî gavanekî têrî bû. Lê nûnerê ku vê dawiyê, li gora masmedya partiyê, li dijî zilma hoviyan bi şev xwe li nav daristanên bajarê Bremenê şewitandibû, di nameya xwe de wilo nivîsandibû, li Kerçoxê pênc salekî xwendegeha dewletê xwendibû û du-sê salekî nûnerayetî li Komîteya Nalbendan kiribû. Mêrik bi salan ji welêt bi dûr ketibû, kohiya xwe ji bîra kiribû û bi ser de jî bi hovî nikarîbû çar gotin bianîna ba hev. Ewrupiyên ku beşdarî konferansê bûbûn jî pir li ber xwe ketibûn, zimanê wî şibandibûn ên zerzûlan û bi xeyd konferans terikandibûn. Her tim wilo dikirin. Bi vekirina konferansê re yek ji vir, dudu ji wir, çar ji dera han radibûn û bêdeng diçûn; carina jî hemû bi hev re radibûn, qeşmeriyên xwe bi aqilê kohiyan dikirin û bi

156

qîjewîj derdiketin. Serok Altaxus jî li himberî wan nerazîbûnan, giraniya xwe dabû ser exlaq û edeba şêrgeleyan û her ji du rojan yek di şûna ê din de dikir berpirsyar û nûner. Lê piştî dît ku bi wî metodî jî bi ser nakeve, navê partiya xwe kir Partiya Sosyalîstên Ewrupayê û bi rêya herdu kanalên televizyonên xwe ên li Ewrupayê li wan şidand. Ji aliyekî ve bi telefonên mobîl û ji aliyê din ve jî di kanalên televizyonan re xwe gihand wan û tam bi derza

exlaq û edeba wan rabû. Dema ku berpirsyar û nûner derdiketin televizyonan ji labîrenta xwe derz û gava ku ji studyoyan bi rê diketin dîsa derz dida wan. Ji destên derzên wî, wilo bi serê berpirsyar û nûneran de hatibû ku êdî nema dizanîbûn bê wê çawa li xwe kiribana. Carekê hema mabû ku serokê parlamentoya wî a ku li Belçîkayê seha fitbolê wek hewşa avaniya Parlamentoya Kohistanê nîşanî belçîkiyan dabû, li ser pevgirêdana xwe hatibaya kujtin.

Serokê parlamentoya wî a ku di a din î hefteyê de bû meclis û piştî mehekê jî bû komele, 80 salî bû. Serok 0039 di êvara Newrozê de bi potîn û qapûtê eskerî û qerewata mozart li studyoya televizyonê bi profesorên civaknasên elemanî re rûniştibû û behsa pez û dewarên Kohistanê ji wan re dikir. Serok Altaxus jî jê hatibû bêvilê, ”kerê çolê, zû wir terk bike”, got û di cih de ew ji studyoyê avêt. Heger ne ji raporên psîkologan bana, Serok Altaxus wê lingên wî jî çerixandibana. Psîkologan ji sosyala hollandî re rewşa serok, wek xurifiyekî tirovirî rapor kiribûn.

Ma ji xwe a ku nûnerê wî ê Ronakbîrên Dinyayê kir, qey wek a serok 0039 bû! Nûner 0123 ji herêma Omarê ji

157

gundê Kerbêtê bû û li ber pez mezin bûbû. Strankî dipeyivî, şeqlovîzkî dida û distend û gava bangî mirovan dikir jî difîkand. Mêrik bi çefî û darê xwe ê şivantiyê derketibû televizyonê û bi ser de jî him darê xwe li Serok Altaxus dihejand û him jî jê re dikwîtand. Serok Altaxus jî dîn û har bû û bi xeberên lewitî ew da ber hev. Dû re jî bi şêrgeleya panelîst re xeyidî:

”Tirê, ma tu li wir çi dikî? Wî ajanî zû ji wir biqewirîne”, got û telefon avêt.
Şêrgele jî hema pê ve beziyan, bi çepilên wî girtin û mîna qerpalekî ew avêtin odeya di rex studyoyê de. 0123 jî bi rapor bû. Lê heger raporên temamê beredayên dinyayê jî ên wî bana, wê xelas nebaya. Carekê pê li şexsiyeta Serok Altaxus kiribû û bi ser de jî ew qeherandibû. Şêrgeleyan piştî ku nûnerê xwe hema li wê derê fetisandin, xistin kîsekî şemedanî û di bagaja texsiyeke mercedes de bi nav bajêr de birin. Ji vê studyoyê û di vê texsiyê de, di hindurê pênc mehan de ev termê şêrgeleyê yazdehan bû ku ber bi lexemên kanalîzasyonan de diçû.
Serok Altaxus derza xwe a exlaq û edebê bi wî haweyî dibir û ji nişkê ve dîsa televizyona Hovbaşê çend rojekî hate girtin. Li gora Çolo vê carê jî Serok Altaxus televizyon dabû girtin. Wî bi wê yeka han li himberî hoviyan taktîkek bi kar anîbû û lingên wan xistibûn soleke teng. Gelek caran, mîna hikûmeta hoviyan, wî jî weşanên rojnameyên ku partiyê li Hovistanê diweşandin sekinandibû û sûc xistibû stuyê hikûmetê. Ji xwe karê wî wilo bû; her tim bi wan taktîkên ku kesî bîr nedibir radibû ser xwe û serî li dijminên
158
xwe digerand. Lê qelemşûrên masmedya hoviyan, di vê carê de ew taktîkên wî pir zarokane dîtibûn û henekên xwe bi aqilê wî kiribûn. Taktîk bi problema wî a bi seroka rêxistina jinan ve girêdabûn.
Seroka partiya ku berê navê wê Partiya Jinên Kohistanê bû, dû re bû Insiyatîva Jinên Hovistanê, dû re bû Koma

Jinên Dinyayê, dû re bû Teşkîlata Jinên Serbixwe û dû re jî bû Komeleya Jinên herî Mezin, bi minasebeta mirina diya Serok Altaxus derketibû televizyonê û bi frensî tiştekî wek terqînê lê dixwend. Jê re due jî dikirin. Seroka ku navê wê 0514 bû, keçek hivdeh salî bû û li Frensayê di nav dîndarên yahovayî de mezin bûbû. Serok Altaxus keçik neda kujtin, da xatirê diya wê, lê ji kujtinê xerabtir jî pê de anî. Erza keçikê pir pîs şikenand.

Serok Altaxusê ku biserketina şoreşê yekser bi teknîkê ve girêdabû û teknîk jî li gora exlaqê xwe bi kar dianî, ji hew bêhtir kar li ber xwe fireh kiribû. Bi qeweta teknîkê hema hema xwe gihandibû herçar terefê dinyayê. Li her cihê ku divabû xuya nekira xuya dikir; ji tuwaletên sînemeyan û heta ku digiha koxik û axurên gundan dengê wî dihat. Bi hinera teknîkê beşdarî mitîngan, şevên şahiyê û dawetan dibû. Di civatên malmezin û parlementeran de rûdinişt. Li ser serê çiyayên herî bilind û nizim, bi şêrgeleyên çekdar re dibeziya, digirt ser qereqol û gundên pîberan û tenterûs ji wan sax bernedida. Bi çekdaran re kemîn datanî, diket kemînan û esker dikujtin. Di newalên herî kûr û tarî û şikeftên xewlecih de qilawizî li ramûsanên keç û xortên şêrgele dikir û bi rêya ”mehkemeyên şoreşê” dawî li jiyana

159

wan dianî. Bi deşt û çiyan û zozanan de hildiperikî, dibû rêber û rê şanî çekdaran dikir. Serok Altaxus ew hemû dikirin û kohiyan jî ew bi dîn û îmana xwe nedidan.

Sala ku baran nedibariya, gundî diçûn ber ziyaretan û bi navê wî dueya baranê dikirin. Gundiyan li ser ruhê wî

pez digurandin, dikirin xêr û xêrat û setqa serê wî didan.
Hin jinên ku di ber pîrikan de xwe bi ser hev de dihesirandin,
ew di hewara xwe de dianîn û diqêriyan:
”Ya Serokê mezinnn!...”
Û gava ku zarok ji wan re çêdibûn jî hema pê re di
guhên zarokan de bi navê wî bang didan. Navê wî li ser
risês dinivîsandin, risas dihilandin û di safokê re bi ser serê
zarokê de berdidan. Bi wî haweyî carina hin zarok dimirin
û hin jî dîn dibûn.
Mela û sofiyan li ser navê Xwedê û pêxember ew dibirin
ber perê ezmên û birêvebirên partî û rêxistinên kohiyan
û bi taybetî jî ên kohiyên başûrê Kohistanê bi minafiqiyê
tawanbar dikirin. Endamên Partiya Islamiya Sosyalîsta
Kohistanê, di limêja terawîhan û cejnên dînî de navê wî
dizikirandin. Û partiyê jî ji bo selameta wî du qam limêj
wek sunet li ser xelkê ferz kiribûn. Lê komika ku bi navê
Partiya Islamiya Faşîstên Kohistanê li Ewrupayê hatibû
damezrandin, ji wê hîn jî bi xoftir bû! Melayan fitwa kujtina
kohiyên ku wek Serok Altaxus nedifikirîn dabûn û
bûbûn sebebê kujtina gelek kohiyên jîr û zana û mêrxas. Ji
aliyekî ve melayan û ji aliyekî ve jî hiqûqzan û hiqûqnasan,
Serok Altaxus xistibûn bin cibeyên xwe û bi daqmoqê dîn
û ilim habela li serê xelkê dixistin. Li gora ku Çolo digot,
160
hemiyan jî ew hemû di ber meqamên tîtikî û parî û kulûjan
de dikirin.
Hiqûqnasan bi navê Mafên Miriyên Sosyalîst komeleyek
saz kiribûn û ji şêrgeleyên kujtî pê ve mafê tu kohiyên

mirî nediparastin. Û rêxistina ku ji bal hiqûqzanan jî bi navê Mafên Zindiyên Komunîst hatibû damezirandin, bi tenê hew li mafên Serok Altaxus xwedî derdiket.
Serok Altaxus dilê miletê kohî fetih kiribû; ji zarokan û hetanî ku digiha pîrên di temara mirinê de, hema hema her kes bûbû heyranê wî. Sirê wê yekê jî hemû bi şerê xwe ê li himberî dewleta hovistanê ve girêdabû. Di wî warî de pir şiyar bû. Dema ku navê wî mûyekî ji ser zimanan diket, çend rojekî, carina jî çend hefteyekî, şerê partîzanî li dar dixist û bi kujtina gelek şêrgeleyan, esker û polîsan dîsa navê wî li herderê Hovistan û Kohistanê derdiket pêş. Carina jî bi kujtina hin îdeologên wî ên ku ji bal mehkemeyê ve dihatin kujtin, navê wî bi mehan ji ser zimanan nediket.
Bi kujtina Dimdim re kohî sê mehekî jê peyivîbûn. Mehkemeyê Dimdim bi sebeba ku medalya xwe a bi navê Şerefa Serok Altaxus kupandibû, bi destê Çolo dabû kujtin. Dimdimê ku nizanîbû derew kiribana, li mehkemeyê hemû rast gotibû.
Li Ewrupayê jî hema hema navê tu kesî bi qasî ê wî nedihat qanê. Dema ku navê wî hinekî dihat ji bîr kirin, dîsa bi taktîkan radibû û kohiyên ku li Elemanyayê li ser sosyalên dijiyan ji bo maf û azadiya miletê kohî radikirin ser tapanan. Şêrgeleyan xwepêşandanên bêqanûnî li dar dixistin, bi deh hezaran kohî li hev dicivandin û bi pankar-
161
tên Serok Altaxus berê wan garankî bi nav otobanan de vedikirin. Otoban jî di trafîkê de dixitimîn û li tevayê Elemanyayê dibû kaos. Piştî ku kaosê bandora xwe li her derê

dikir, vê carê jî di temamê radyo û televizyonên elemanî de,
Serok Altaxus dibû mijara herî sereke û nav û dengê wî
digiha hetanî bi karkerên ku kanalîzasyonên nav bajaran jî
paqij dikirin. Di xwepêşandanekê de karkerên ku kanalîzasyonên
St.Paula Hamburgê paqij dikirin, tifî wêneyên wî
kiribûn û li xezeba şêrgeleyên ku li wan deran piyase dikirin
rast hatibûn. Heger polîs zû bi wan ve negihabana wê
sed û bavek ji hev çêkiribana. Şêrgeleyên ku gotibûn ”bijî
Serok Altaxus” û karkeran jî gotibûn ” scheise Serok Altaxus”,
di zaboq û qorzîbirên kerxaneya St.Paulê de bi horzan,
çakûç û kêran kişiyabûn hev û her der di nava xwînê
de hiştibûn.
Lê di binyata xwe de pevçûna mezin di heman rojê de
li Kolnê rû da bû. Şêrgeleyan mîna xwepêşandana li Hambûrgê
bêqanûnî nekiribûn. Li Kolnê ji meqamên dewletê,
di bin navê ”bijî birayetiya gelan û bimre şer” de, destûra
ku li derveyî bajêr li hev civiyabana stendibûn. Lêbelê şêrgeleyan
dîsa taktîk bi kar anîbûn û bi haweyekî din lê xistibûn.
Bi deh hezaran kohî li hev civandibûn û bi pankartên
”bijî dijminahiya gelan û bijî şer” berê hemiyan bi nav bajêr
de vekiribûn. Birêvebirên meqaman jî ew yeka han wek
destavêtin û bêrûmetiyeke mezin bi meqamên xwe re dîtibûn
û berê polîsên xwe bi nav xwepêşandêran de vekiribûn.
Ji danê sibehê û hetanî bi danê êvarî di bajarê Kolnê de
çerxa Ewrupayê sekinîbû û polîs û xwpêşandêran habela li
162
hev xistibûn. Li gora îdeologên partiyê heger esker jî nehatibana
bi hewara polîsan, wê şêrgeleyan encameke hîn baştir

bi dest xistibana. Televizyonên elemanan û heta ên
temamê welatên Ewrupayê berê xwe dabûn wê pevçûnê û
wêrekî û mêrxasiya şêrgeleyên kohî pêş dinyayê kiribûn. Ji
bilî wê çend kanalan jî du rojan li ser hev di derbarê jiyana
Serok Altaxus û mezinahiya wî de ha ha weşan kiribûn.
Serok Altaxus di nav ewrupiyan û bi giştî jî di nav elemanan
de pir hatibû naskirin. Gelek alîgirên wî ên barûte
û anarşîst jî çêbûbûn. Kesî bi qasî barûteyên ku ji kohî,
hovî û çoliyên ewrupî pêk dihatin navê wî bi kar nedianî.
Bi şev û rojê şûşeyên bîra û şerabê di destên wan de bûn,
ji ber wê bar, banof û sikakê ber bi bar, banof û sikaka din
ve dibeziyan û navê wî mîna selewatên Leyletul qedirê dizikirandin.
Hinan ji wan jî zendên xwe bi sûretê wî deqandibûn.
Lêbelê rewşa anarşîstên elemanî ji a wan hinekî cihê bû.
Anarşîtan bi tenê dema ku didan nav trafîka bajêr û pê li
terempêlan dikirin navê wî bi bîr dianîn. ”Bijî Serok Altaxus”,
digotin û pehîn li terempêlan didan. Lê herçi Serok
Altaxus bû jî qet kêfa wî ji wan re nedihat. Di xwepêşandanan
de anarşîstan pêşî him hinekî bi a şêrgeleyan dikirin
û him jî hetanî derekê bi destûr û rêbazên Serok Altaxus re
bûn. Lê piştî ku şêrgeleyan di xwepêşandanan de zirz ajot
ser wan û bi hemû haweyî xwestin ku ew jî wek wan tevbigerin,
anarşîst engirîn û di pêşiya wan de bûn kelem.
Dema ku şêrgele bi def û zirneyê dadiketin meydana
xwepêşandanê, ew jî bi teblik û borîzanên şer di nêzîkî wan
163
de qor bi qor li hev kom dibûn. Ku xwepêşandêran li ser
Serok Altaxus dest bi stranan dikirin, wan jî hema dest bi

merşa kohiyan a neteweyî dikir. Şêrgeleyan radihiştin sûretên Serok Altaxus, wan jî radihiştin sûretên serok û tekoşerên kohiyên ku bi destên hoviyan hatibûn kujtin. Li ser pankartên şêrgeleyan her tim ”bijî sosyalîzim” û li ser ên wan jî her tim ”bijî Kohistan” nivîsî bû. Şêrgeleyan ala partiyê û wan jî ala Kohistanê bi dest xwe ve digirtin. Dema ku şêrgele diqêriyan û digotin ”bijî Serok”, wan jî digot ”bijî Kohistan!” Û herwekî din.

Rewş her tim wilo bû û li Elemanyayê jî anarşîst pir bûn. Di dawiyê de li Frankfurtê li hev teqandin:

Serok Altaxus ji labîrenta xwe bi xwepêşandêran re dipeyivî, her kes rabûbû ser xwe û di temenê de bêkip lê guhdarî dikirin; û li aliyê din jî anarşîstên ku barûte jî dabûn dû xwe habela ala kohî li ba dikirin, berê hoperlorên xwe bi hoperlorên ku şêrgeleyan bi dîrekên dirêj ve daliqandibûn vedikirin, diqêriyan û li vir û wir û dera han didan lotikan. Şêrgeleyan jî bi çavên ku hemû bi carekê ve ajan û guhderzên hoviyan bûn li keft û lepta wan dinerîn û gotinên çort bi wan re dikirin. Lê piştî ku wan jî bi zarê xwe ew bersivandin û çend têriyan jî ji dera han gotin ”hek!” çendekan jî ji dera din gotin ”pek!” ji nişkê ve ew qiyameta ku her kes li bendîbû rabû û melekên rehmê û xezebê daketin dinyayê! Pevçûna wan hinekî dişibiya şerê ku li Uhudê di navbera Ebû Sufyan û Mihemed de qewimî bû. Her kesî nav di xwe de dida, mîna hespan dişêqiyan û bêkeys xwe di hev de werdikirin. Heger berpirsyarê Şerê

164

Ewrupiyan 013 bi paş de gav neavêtibaya û pevçûn bi wî

rengê ku herdu hêl jî tam ji hev dagirtîbûn hema pênc
deqîqeyekî dom kiribaya, dibû ku anarşîst li ser koka şêrgeleyan
rûniştibana. Anarşîstan xwe di kêr û zincîr û debûzan
de çikçikandibûn. Û bi ser de jî di wan deman de ji
elemanê herî sosyalîst û hetanî ku digiha elemanê herî
faşîst, piçûk û mezin her kes ji şêrgeleyan hatibûn bêvilê.
Berpirsyêr, şêrgele û kohiyên bi dû wan de ji belayeke
mezin filitandibûn lê çi fêde, mêrik zû jî ji canê xwe bû. Bi
dû xwepêşandana Frankfurtê bi hefteyekê li Bochumê xwepêşandaneke
pir mezin li dar ket û di heman rojê de bi şev,
termê wî ji bal pîreke ku boncîka xwe digerand li nav daristanê
şewitî hat dîtin. Pîra eleman ew rakiribû nexweşxaneyê
û bi rê de miribû.
Di xwepêşandana Bochumê de jî pevçûn derketibû û
013 ew pevçûn jî bêxwîn sekinandibû. Di masmedya partiyê
de, şewata berpirsyar 013 wek protestoyeke li himberî
zilma dewleta elemanan hatibû ragihandin. Û piştî çendeyekî
jî li ser şewata wî, li çend bajarên mezin, di heman
demê de xwepêşandan li dar xistin.
165
Serok Altaxus bi şoreşa dinyayê rabû
Serok Altaxusê ku bi hemû haweyî şoreş li ber xwe fireh
kiribû û çendeyek berê ji qehra ewrupiyan navê partiya xwe
kiribû Partiya Sosyalîstên Rohilata Navîn û piştî hefteyekê
jî navê wê kir Partiya Sosyalîstên Cîhanê, vê carê jî berê
xwe tam da Ewrupayê û ji wir jî da temamê dinyayê. Li
gora wî Ewrupa navenda tarîxa şoreşan bû û çerxa temamê
dinyayê li wir dizîvirî. Ji ber wê yeka han pêşî li Holandayê

bi haweyekî heşkere û li Elemanyayê jî pir bi dizî bingehê du cumhûriyetan danî û hema zend û bendên xwe li pevxistina enternasyonala 19an vemalandin. Enternasyonala wî a 18an, ji hin ewrupiyên ku wek ”Baba” dihatin naskirin pêk hatibû û çar mehekî ajotibû. Di eslê xwe de ew hîn di şeva pêşî de ji hev belav bûbû, lê partiyê dest danîbû ser devê kewarê. Civîna wê a pêşî bi heft damezrîneran li Elemanyayê bajarê Barzinghavzê bi dizî li mala şêrgeleyekî xuyayî pêk hatibû; di hindurê nîv seetê de garanek polîsên ewrupî, bi keriyek kûçik avêtibûn ser malê û tev li Çolo her heft damezrîner girtibûn. Çolo wek nûnerê Serok Altaxus beşdarî civînê bûbû. Mazûbanê malê şêrgeleyê omarî, keriyê kûçikên ku her derê malê bêhn kiribûn, bi sebeba ku li arşîva partiyê geriyabûn ji der û dorê re rave kiribûn. Enternasyonala 19an bi hemû haweyê xwe ji a 18an bi rêk û pêktir û pir jî mezintir li gundekî Trablusê di bin sereketiya Serok Altaxus de bi dizî civiya. Di wê civînê de ji bilî serekên proleterên welatên emperyalîst, hema hema serekên temamê proleterên welatên bi paş de mayî beşdar

166

bûn. Proleterên srîlankî, afganî, sûdanî, dofarî, bûrmî, kolombî, ernawîtî û bosnî ji her kesî bêhtir nûnerên xwe rêyî civînê kiribûn. Ji Efrîka Başûr eşîra Lûlû bi sê nûneran, eşîra Zûlû bi duduyan û sirbî jî bi nûnerekî xwe di rêza dawiyê de bûn. Lê nûnerên van herdu welatan jî beşdarî civînê nebûn. Nûnerê sirbî çawa ku ji balafirê daket, wilo jî ji nişkê ve hat revandin û ên lûlî û zûlî jî bi kêr û şîşên ku di hev werkiribûn li nexweşxaneyan diman.

Armanca enternasyonalê a sereke ew bû ku li temamê cîhanê sîstema sosyalîzmê pêk hatibaya. Û ji bo wê yeka han jî pêşî divabû li welatên xerabe agirê hêtûna şoreşa sosyalîzmê bi cendekên dîktatoran hatiba dadan. Bi rivînên wî agirî jî kelaxê proleterên Ewrupa roava disincirî û proleterên enternasyonalîst ha li vir û ha li wir xwe di ”pilingên emperyalîzma kartonî” de werdikirin. Lê çi fêde, di civîna roja 29an de li ser birêvebiriya rêxistina enternasyonalê hemû ji ber hev ketin û di navtarên gundê Ebû Şemer de bi kevir û daran li ber hev pahn bûn. Hinekan keleşkof û demaçe jî bi kar anîn. Heger polîsan esker jî nedabana dû xwe û êrîşî ser wan nekiribana, hizbullahên ku wek hevalbendên wan ên stratejiyê beşdarî civînê bûbûn, wê qira wan bianîna. Hizbullahan du bombeyên destan avêtibûn nav du komikan, neh nûnerên proleter hatibûn kujtin û 15 jî birîndar bûbûn.

Di wê navê re jî Serok Altaxusê ku dîsa bi telefona destan beşdarî civîna enternasyonalê bûbû, rûdan wek lîstikek emperyalîstan dît, piraniya nûneran bi ajantiyê tawanbar kir û bi hemû haweyî xwe ji enternasyonalê vekişand.

167

Dû re jî bi carekê ve hêviya xwe ji sazkirina enternasyonalan birî, temamê proleterên dinyayê, nûner û birêvebirên wan bêminet kirin û bi tena serê xwe bi barê sosyalîzma cîhanî rabû. Ji bo bi serketina wê armancê jî heta ku ji dest hat giraniya xwe da ser masmedya partiyê, berê wê yekser bi dinyayê de vekir û bi haweyê çeq û berê bi emperyalîstan re lîst. Şêrgeleyan bi qelema xwe û wî jî bi televîzyona

partiyê li emperyalîstan şidand.
Serok Altaxus bi rêya televîzyonê gelek mahrîfetên xwe
bi kar anîn û hema hema xwe gihand kohiyên li her derê
dinyayê. Tiştekî ku wî nizanîba, nedîtiba û nebihîsta tune
bû. Ji bilî ku her roj di televîzyonê de derz da şêrgeleyan,
şîret li temamê xelkên dinyayê kirin û dewletên ewrupî bi
zirt û pirtan ji hew bêhtir şewitandin, herwiha jî ji heftê
carekê ji welatên Efrîkayê, Asyayê û Emerîkaya Latînê lingvîst,
fîlolog, sosyolog, etîmolog, psîkolog, antropolg, astrolog,
jeolog, pedagok, doktor, hemşîre, ekonomîst, fîlozof,
tarîxnas, hiqûqnas, nanpêj, êzingvanî, sefar, kurtanker, nalbend,
xerat û herwekî din li studyoyê civandin û bi seetan
ji kar û barê wan peyivî. Carcarê hin alimên ewrupî jî bi
rêya telefonan beşdarî devjengên wî bûn; lê hema pê re jî
bi hêrs telefon girtin û tu carî nema deng ji wan hat. Li
gora şêrgeleyan, carina hin têgehên Serok Altaxus ji ber ku
ewqasî kûr û hûr bûn, ên lê guhdarî dikirin baş tê nedigihan
û ew yeka han jî dibû sebebê nerazîmendî û nexweşiyan.
Carekê jineke têrî piştî ku li semînera wî a di derbarê
dadana tenûran û nanpêjiyê de guhdarî dike, tenûrê bi
168
komirê tam dadide û nanê xwe piçekî şilikî pê vedide. Lê
çi fêde kuflet bi nên bi jehrî dikeve û du zarokên wê dimrin.
Reyisê malê wilo digot û rojnameyên partiyê jî bi
haweyekî din bûyer rave dikirin. Ravebêjan her tişt bi sersariya
jinikê ve girêdabûn. Li gora wan heger jinikê tenûr
sarûgermî nekiribaya, kesek ji wan nedimir. Carekê jî
xeberdana wî a li ser madeyên kimyayî bala profesorekî ereb

pir kişandibû. Piştî xeberdanê, profesorê bîst û çar salî
bêhnçikyayî berê xwe dabû labratowara xwe û di hikmê
pênc-şeş deqîqeyan de xwe û labratowar bi hewayê de xistibû.
A ku bi serê lingivîstê efrîkî hatibû jî ne kêmî a profesor
bû. Mêrik piştî xeberdana wî a li ser ”zimanên ku di
qelşik û terkokên risla mejî de veşartîbûn”, hişê xwe xwaribû
û bermeqlûbkî peyivîbû. Piştî demekê jî lal bûbû.
Lê asas a herî nexweş gava ku Serok Altaxus bi zimanê
kohî dipeyivî, derdiket. Ziman ji kirês dikir, didiqdiqand û
bi vir û wir de diçelpand. Temamê rengdêrên xwe, mîna
navdêrên nêr û di teşbîha têgehên felsefî de bi kar dianîn.
Ji ber wê yeka han îdeologan jî ji bêgavî ferhengek ku ji çar
rûpelan pêk dihat çap kiribûn û li şêrgeleyan belav kiribûn.
Heger ne ji wê ferhengê baya dibû ku şerê di navbera
kohiyên jêrê û jorê de tu carî nesekinîbaya.
Gava ku Serok Altaxus dipeyivî û têgeheke wî çort dihat
fêhmkirin, îdeologên bergir bi têgehan ve dibeziyan û ji
rexnegiran re hema şerh dikirin. Di ferhengê de li ber temamê
navdêrên mîna ”ker, kûçik, tajî, mîh, bizin, beraz, rovî,
mişk, cirdon, dîk, mirîşk, elok” û her wekî din rengdêreke
169
ravekirî hebû. Lê di homonîm, homograf û homofonan de
pir gengeşî hebû û ew gengeşî jî bi giştî li himberî rêxistinên
başûrê Kohistanê dihatin bi karanîn. Carekê dîsa li ser
peyvekê hindik mabû ku şerekî qut î girover derketibaya.
Serok Altaxus bi êvarkî re derketibû televîzyonê û digot:
”Serekên kohiyên başûrê welêt di dawiyê de tireke wilo
dijwar bi ser me de berdan ku bêhna wê li temamê Kohistanê

belav bû!”
Lê piştî ku serekan bi xwe nexweş anîn û xwediyê gotinê bi bêedebiyê tawanbar kirin, vê carê jî îdeologan ber girtin û gotin:
”Hûn çewt tê gihan e. Serokê sosyalîzma cîhanê, têgeha ´tirê, yan jî tira xwe´, di wateya terempêlê de gotiye. ´Tir´ di zimanê hind û ewrupî de, homonîmeke ku mirov dikare jê re qemyona mezin jî bibêje.”
Civînên Serok Altaxus ên ilmî bi giştî bi şev bûn. Carina li derdora destê sibehê jî civînên wî dibûn. Lê ji ber ku dema hatina wî heşkere nedibû, pirê caran civînê bi wî tenê destpê dikir. Lê zemanê civînên wî ên bi şevê, ne her tim ba jî, heşkere dibû. Sipîkerê piştî ku bi temamê zimanên Rohilata Navîn û çend zimanên efrîkî û di vê dawiyê de jî bi srîlankî deng û behs diqedandin, seet dibû yazdehê şevê, carina jî bêku deng û behs bigotana, anons dida û bi zimanê kohî digot:
”Ey temamê cîhanê, bi dîqatî guhadar ke!
Aha tam aniha li ser xeta ûzayê, Îrada temamê proleter û xelkê dinyayê sekiniye û îro jî hezretî cenabê wî dê li ser durûma temamê kayinatê, înformasyonkî kûr û ewqasî jî
170
hûr bide we!...“
Ji kesên ku li studyoyê rûniştîbûn û hetanî ku digiha alîgirên Serok Altaxus ên 7-8 salî mîna spîkerê di temeneyê de vêl disekinîn û bi haweyê ku ”Îrade“ didîtin stuyê xwe dirêj radidan, qîq dinerîn û bi çar guhan guhdarî dikirin. Rûniştin û guhdarîkirina bi wî rengî bûbû kultur. Kohiyên

li herçar terefên dinyayê bi wê temtêlê dikirin. Îcar di wê navê re her gava ku deng ji telefona Serok Altaxus dihat, wî bersiva telefona xwe dida û erza ên ku telefon jê re kiribûn dişkenand, kesên ku li studyoyê rûniştîbûn jî gotin dibirin ser xwe, dilê xwe digirtin û hin tiştên nexweşik pêtî didan. Li ser kesên ku wî di hindurê studyoyê de bêerz dikirin û bêerziyên wî ên bi telefonan, hema hema her şev kesek-dudu bi dilmanî ji civata studyoyê radibûn. Ên ku ranedibûn jî hetanî bi dawiyê mîna barê hejikan vepelixî bêkip rûdiniştin. Lê di a din î şevê de mîna ku şava çûyî qet tiştek ne qewimîbû bi kêf û eşq dîsa dihatin. Piraniya wan jî ronakbîrên kohî bûn. Û bi ser de jî mîna tarîxzanê êrîvanî ji asta herî bilind bûn.

Tarîxzanê ku ji kohiyên Êrîvanê bû, xwe ji Serok Altaxus re kiribû erd û digot:

”Ho îradeya temamê jar û hejarên dinyayê! Ho mezinê min û bavê min û temamê miletê kohî! Ma gelo ez karim ji hezretê cenabê te re bêjim ku tu ji wê dinyayê bi hewara me kohiyên ne tiştek ve hatiyî?“

Serok Altaxus jî bi hoqeboq dikeniya û digot:

”De ji xwe re lê binerin, tew bi ser de jî kuspo alim e û di nav kohiyan de qaşo alimê herî naskirî ye, hi(!)”

171

Tarîxzanê tarîxnivîs vê carê jî xwe jê re kir zibil:

”Tu ji qenciya xwe van gotinên mezin ji bo min dibêjî. Li himberî qudreta ilmê te ê bêhempa, alimtiya min bi qasî ziblê binê sola te jî nayê!

De ka bêje serokê min, gelo bi rastî tu ne ji wê dinyayê

bi gazî û hewara me belengazan de hatiyî?“
Serok Altaxus piştî ku ji kenan lal bû, ji nişkê ve kenê
xwe birî û dengê xwe hilda:
“Na. Lê ez ne ji dinyaya we me jî”, got û bi hêrs bi ser
ê ku bi telefonê pê re dipeyivî hilbû. Tif jî kirê.
Gotinên Serok Altaxus li ba rêxistinên wî ên dîndar
bûbûn gotinên xwedayî; li ba rêxistinên wî ên hiqûqnas
bûbûn qanûn û li ba ronakbîrên wî jî bûbûn ilim. Zirzopî,
durûtî, solalêsî, şelafî, pivikî û şinikî bûbû camêrî. Xeberên
Serok Altaxus ên ku di kultura kohiyan de mêr li ser dihatin
kujtin, di nav xelkê de wek şîretan dihatin qebûlkirin.
Pêstûrî, bêerzî û qeşmerî bûbûn marîfetên herî maqûl.
Gotineke Serok Altaxus ne li erdê diket û ne jî bi avê de
diçû. Çi tiştê ku digot dihat nivîsandin û wek kitêb çap
dibû. Berî sazkirina televîzyonê, hejmara kitêbên wî gihabûn
du sed û dehan. Lê dû re hejmar ji hesaban ket û hindurê
malan bi kitêbên wî bûn kitêbxane. Kitêb jî hemû bi
zimanê hovî dihatin nivîsandin û dû re jî wergerî zimanên
din dibûn. Lêbelê digel wî haweyî jî hema hema tu kesî
neh-deh rûpelek ji tu kitêbên wî nedixwendin.
Çend kitêbên wî ên ku du şêrgeleyan bi dizî wergerandibûn
zimanê kohî jî hebûn. Lê çi fêde, piştî ku herdu li
ser wergera xwe hatibûn kujtin, kitêb serbest bûbûn.
172
Dawiya Serok Altaxus
Serok Altaxus di televizyonê de xwe tam lê berda û bi
haweyê ku bi şêrgeleyên xwe, serok û ronakbîrên kohiyan
re dipeyivî, bi serok û ronakbîrên miletên din re jî peyivî.

Di wî warî de gelek kesên xuyayî bala wî kişandin ser zarê ku bi kar dianî. Lêbelê wek ku ji tehtê re digotin, diket vî guhî û di guhê din re derdiket. Ji bo wê yekê ji Ewrupayê gelek caran hin ronakbîrên navdar bi bafîka ku lîçikekî kubar bipeyive çûn Keleha Mezlûman û xwe avêtin tor û bextê wî. Lê dîsa jî nebû tiştek. Ne xema wî û tiştekî bû; wek dohnê ku tu di qûna berêz de bidî qet tesîr lê nedikir. Ruyê wî mîna çaroxê ji tiştekî nediêşiya. Kê çi digot wî singek pê vedikir, di hawinê xwe de dikuta û her li pêpîka xwe dixist. Xap û xîp û zirt û pirt, taktîkên stratejiya şoreşa sosyalîzmê didît û ew taktîk bi kar dianîn. Wilo digot. Emperyalîzm îlana şerê insaniyetê bû û wî jî bi serhildana li dijî emperyalîzmê insaniyet li ser lingan dihişt. Xwe wilo diparast. Bi emperyalîstan re asas şerê mezin psîkolojîk dibû û wî jî bi wê psîkolojiyê rahiştibû wan. Emperyalîst ji dengê gundî û karkeran ditirsiyan û ew jî bûbû def û zirneya temamê gundî û karkerên dinyayê. Bi çavê ku hîmdarê sosyalîzma cîhanî bû li xwe dinerî, wilo tevdigeriya û di televizyonê de habela bi ser emperyalîstan hildibû. Di rêya komînîkasyonê re emperyalîst xistibûn ”qaqareş!” Rewş ev bû û ji nişkê ve seet li derdora yekê şevê qîr û qiyamet li labîrenta wî ket!

Temamê robotan bi haweyê ku a xwe lê kiribûn yek, di

173

heman demê de lempa sor pêxistibûn û her yekî ji hindama xwe de bi qîjewîj digot:

”Ajan hat, ajan tê, ajan, ajaaaan!...”

Bi dengê wan re çelq û pelq li Serok Altaxus ket û mîna

mişkê ku ji ber pêncî pisîkî direviya, çi qula ku ket ber xwe lê qerase kir. Lê gava robotê ku li nêzîkî wî bû got ”cehş jî hatin!” û ji odeya din jî robotekî got ”îşbîrlîkçî jî bi wan re ne”, Serok Altaxus tam ji desthilanîn ket û bi dengê xwe ê herî bilind qêriya:
”Hewarêêê!...”
Robotan vê carê jî li zengilan xistin. Û lêxistina zengilan jî dihat wateya ku dijminan nêzîkayî li labîrentê kirine.
”Hahooo!” got û serserkî kumuşî erdê.
Heger robotekî negota ”derî, derî...” belkî hîç derî nehata bîra wî û di derî re li reva xwe ne fikirîbaya.
Serok Altaxus ji canelametî da xwe û bi derî ve beziya.
Bi derî zêde daneket, zû vekir, derbasî odeyê bû û bi lez û bez kişiya deriyê din. Ew jî di cih de vekir û bi wê kelecanê çû ê din. Lêbelê çawa ku derî vekir û ji wê odeyê derbasî odeya din bû û robotekî got ”ajan li devê derî ye”, dîsa bû ew ê berî niha û mîna zîzokê habela li hev zîvirî. Dû re jî gêj bû, ji hindam de ket û mîna bereteyekî bêhis û pis li wê navê veziliya.
Robotan piştî ku bi qasî pênc deqîqeyan lempeyên sor ha ha vêxistin û vemirandin û bêwestan qêriyan, vê carê jî lempeyên kesk vêxistin û gotin:
”Ajan bi paş de vekişiyan, felaket çû, derî veke, êdî her tişt normal e.”
174
Ev cara sisêyan bû ku robotan wilo lê dikirin. Û ew jî qet lê nedifikirî ku labîrenta xwe terk kiribaya. Di cara berî vê de dîsa di televizyonê de bi xeberan daweriqandibû

cihûyan û tam heft deqîqeyan hirmegirm li robotan ketibû.
Heger robot ne sekinîbana, ji sedî sed wê ziravê wî qetiyaba.
Qidûmşikenandî bûbû û behetî li erdê veziliyabû.
Serok Altaxus piştî ku hêdî bi hêdî bi ser hişê xwe ve
hat, hema li qûn rûnişt û mîna dînan li hawêrdora xwe
nerî. Hawêrdor di bêdengiyê de xerq bûbû. Deng ji temamê
aparatan biliya bû û pêjina tu tiştî nedihat. Ew rewşeke
xerîb bû. Bi serê wî de tiştekî wilo hîç nehatibû. Bêkip
rawestiya û bi haweyê ku ji rewşê fêhm bike guhê xwe da
ser temamê kayinatê. Lê çiqasî guhdarî kir ewqasî jî tevzînok
bi canê wî ve hilkişiyan û di cihê xwe de habela qelqilî.
Dengê tevgera kayinatê ji hindurê labîrentê mîna borîzana
şer di guhên wî de vedida. Lerizî û bi şelûpeleyeke
belengazî li bêrîkên xwe xebitî. Zû bi ser herdu telefonan
vebû û bêhnçikyayî pê li pişkokan kir. Lê telefon nexebitî.
Ew avêt û bi a din daket. Ew jî nexebitî. Xwe çeng kir telefona
bi dîwêr ve û bêyî ku pê li pişkokên wê bike da ber
guhê xwe. Piştî ku deng ji wê jî nehat, destên xwe di ber
xwe re berdan, çitikî sekinî, qîq nerî û temamê awira xwe
berda ser dîwarê ku berê wî lê bû. Dîwar jî bi gulan neqişî
bû û li ber her gulê bokînek û kulîlkek hebû. Û bi sedan
wêneyên wî jî di nav wan gul û kulîlk û bokînan de bûn.
Serok Altaxus hetanî bêhnekê jî bêyî ku ji dest xwe biçe
û xerab bikeve li dîwêr nerî. Wî çiqasî li dîwêr nerî dîwar
jî di çavên wî de ewqasî fireh bû û temamê neqşên ku bi
175
dîwêr vebûn, hêdî bi hêdî di rengê esker û komutanên
hoviyan de liviyan. Çend hilm neketin wê navê Serok Altaxus

sahw girt, ji qidûm ket û bêyî ku çavên xwe ji ser diwêr dagerîne rûnişt. Lê çawa ku rûnişt, hema xwe da ser çar lepikan û qêriya:
”Haho min nekujin!”
Dîwar tena tena û bi hêdîka pê re peyivî:
”Me tu bi qasî imperetorekî mezin kir û tu jî bi me re xayin derket, em ê ji te re nehêlin!”
Serok Altaxus piştî ku dîwar ha ha maçî kir û bi kelûgirî got ”na, haşa! Min tu carî xayintî bi we re nekiriye, min karê xwe dikir”, vê carê jî stuyê xwe li ber lingên komutanan rada û bi rengekî din got:
”Şensekî din bidin min…”
Di wê navê re jî psîkologên wî, Moşê, Corc û sûbayên ku bi cilên eskerî li odeya din sekinîbûn, dikirin pistepist.
Lê gelek neket wê navê ji nişkê ve elektrîk vemirîn û her der bi şintaqê bû wek nava rojê. Bi vemirandina elektrîkan û şintaqê, Serok Altaxus rimekê ji cihê xwe bilind bû, ”eeehew, ajanan ez hilanîm!” got û nehişî li erdê veziliya.
Lê psîkolog û textorên dil û zirav û kezebê zû pê ve gihan; bi hilmekê re ew şiyar kirin û hema xwe ji ser dan alî. Piştî ku wan xwe ji ser dan alî, hersê sûbayan jî bi hev re dadan ser; yekî pehîn li termazên wî xistin, yekî bi pêxêla wî girt û ew hejand û ê din jî xwe bi ser de daqûl kir û bi hêdîka jê re û got:
”Xayin em gihan dawiya flîm, rabe ser xwe da em biçin.”
176
Serok Altaxus yek nekir dudu, mîna pisîkê çengî wê

navê bû, di temenê de çitikî sekinî û got:
”Emir bike komutanê min!”
Komutanê wî jî hema şiqamek pê ve zeliqand:
”Kewaşeyê mêran”, got û destê xwe avêt kelepçeyên di kêleka xwe de.
Çawa ku çavên Serok Altaxus bi kelepçeyan ketin, mîna hespê ku çav mêr bikeve gazekê bi paş de pekiya. Dû re jî wek parsekan destên xwe ji kelepçeyan re radan, giriya û bi dengekî fetisî got:
”Şensekî bidin min. Heger hûn bihêlin ez bijîm, bawer bikin ez ê cumhûriyeteke wilo qewîn ji we re ava bikim ku hetanî dinya hebe xerab nebe! Ez xulamê we me, şensekî bidin min da ez koka miletê kohî bînim û di Rohilata Navîn de hoviyan bikim miletê herî mezin!”
Komutên vê carê jî tifî ser dev û ruyê wî kir:
”Yanî niha tu jî zilamî, ha!” got û rêya ku ji labîrentê derkevin pêşê kirê.
”Dibe ku min li gora we car carê hin tiştên xerab kiribin, lê bawer bikin min çi kiribe jî, min hemû ji bo selameta cumhûriyetê kiriye!...”
Komutên pê li ferşê lingê wî ê rastê kir ”bimeşe”, got û destê xwe ji psîkologan re hejand.
Serok Altaxusê ku xwe li ber serê mirinê hîs dikir û bi derketina ji labîrentê re jî xwe mirî dihesiband, nemeşiya. Nikarîbû ji cihê xwe biliviya jî. Çongên wî li hev geriyabûn û ha ha dilerizîn. Komutên ziqitandê û gava xwe avêt. Serok Altaxus da xwe ku biçe, lê lingan bi a wî nekirin.

Kumişî erdê, xwe li çîmên komutên gerand û bi kelûgirî jê re got:
”Min nekujin, şensekî bidin min!...”
Komutan tam hêrs bû, çend pehîn tê werkirin û got:
”Nalet li wan kesên ku tu kirin zilamê xwe û li wê koma ku tu kirin mezinê xwe bê!...”
Komutan hîn wilo dipeyivî û psîkologan jî Serok Altaxus li çardaxê kiribûn û bi lez û bez ji labîrentê derdiketin.
178

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

www.nefel.com
info@nefel.com
NEFEL

Sê şev û sê roj
1
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

2

Sê şev û sê roj
LALEŞ QASO
NEFEL
Stockholm
2002
www.nefel.com
info@nefel.com

3
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Laleş Qaso: Sê şev û sê roj
Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden
www.nefel.com
info@nefel.com
© Laleş Qaso û Nefel
Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-89687-10-8
Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan
Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.
Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.
4

Sala 1969an
Qereqola hidûd di sala 1958an de, di berpala başûrê girê Qesra de hatibû ava kirin. Di serê gir de ji dema ku qereqol hatibû ava kirin pênc dîrekên dirêj çikandîbûn. Bi van dîrekan ve daliqandî gelek mirovan can dabû. Li hawêrdorên gir bi kevirên bestan, boyax û kilsê wiha hatibû nivîsîn:
»Tirkek bedelî cîhanê hemî ye! Her tirk esker çêdibe! Ev welatê me ye! Welat yekperçe ye!«

Di rohilat û roavayî gir de dîsa ji kevirên bestan bi qasî deriyên sûr û dêrên kufarî mezin rengareng du wêneyên eskerên tirk hebûn. Wêne bi haweyekî pir balkêş hatibûn çêkirin. Mirov ji wan heybet digirt! Serê eskeran bi mîxfer, newqên wan yekser bi rext û fîşek û bomban rapêçayîbûn. Potînên wan ên bi niçik, bi qasî tabûtên zarokan dirêj û mezin bûn. Mîxên kubikî ku seranser di qiraxên potînan de çikandîbûn; mîna qesnaxên cenceran xwe dabûn der. Destên xwe ên çepê kiribûn kulm û danîbûn ser sênga xwe. Tivingên wan ên bi qezetore di destên wan ên rastê de bûn û berê tivingan jî bi bakur ve bû. Qezetore heta ku digiha lûla tivingê bi carekê ve ji boyaxê sor bûn. Ji serikên qezetoran mîna ku xwîn binisile bi lez dilopên boyaxê xwe berdidan. Di nav şeqên wan de kelaxekî bêserî, ji kelax hinekî dûr di bin lingê çepê de seriyekî devjihev û zimankişiyayî hebû. Li jêra gewdê serjêkirî ji boyaxa sor bi tîpên mezin jî wilo nivîsîbû:
»Xwezî bi dilê wî ê ku dibêje ez tirk im! Tirk mezin e!«
Gava mirov bi terempêlê ji Qosarê ber bi Nisêbînê û ji Nisêbînê ber bi Qosarê de diçû û nêzîkayî li gir dikir, gir ji esker û termê insên di çavên mirov de bi qasî çiyayekî bêper bilind dibû. Ji sawa ku vî girî dida, Reşo her ku diçû Nisêbînê xwe berdida ser rêya Menderê û li vegerê dîsa di rêya vî gundî re dihat malê. Gir, ji gundiyên derdor bêtir tesîra xwe li ser qesiriyan dikir. Remoyê qesirî di rojên ku wê ber bi derekê de biçuya, ji gund heta ku dihat ser rêya Îpekê, da ku gir nebîne, şifqa xwe dixist nav çavên xwe, ziq li erdê dinerî û dimeşiya. Dûv re jî ji ber gir mala xwe bar
5
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

kir û li Zorava bi cih bû.
Li vê qereqolê sih û şeş esker diman. Ev hejmar carina bilind jî dibû. Li

hewşa qereqolê seraqet cîb û cemsek û panzêrek sekinîbûn. Eskeran bi van terempêlan hidûd saxtî dikirin û didan pey qaçaxçiyan. Îcar di şevên ku teqîn dibû û bi qaçaxçiyan re remî dikirin, ji qereqola Kewke û Nisêbînê jî hewar bi qereqolê ve dihat, hejmara terempêl û eskeran bilind dibû. Li vê qereqolê wekî din jî di hindurê heftê de bi kêmanî sê, çar caran terempêlên ku ji hêla Nisêbînê ber bi Mêrdînê û Qosarê de diçûn, saxtî dibûn.

Qereqolê keriyek pez xwedî dikir. Li vir her roj du pez ser jê dibûn. Qesabiya qereqolê jî Cimoyê zoravî dikir.

Besta Zorava ji aliyê rohilat ve di ber gir re dirêjî nav mayinan dibû; binya hesin derbas dikir û xwe bi nav erdê binxetiyan de berdida. Best heta bi çend sal berê jî seraqet diherikî; lê di dûv re hêdî hêdî av ji ser qut bû û best ku lehî raneba, di zivistanan de jî nema herikî. Di jêra gir re rêya Îpekê derbas dibû. Deriyê qereqolê li rê dinerî. Di qiraxa rê de pêşberî hev du kulûbên eskerî hebûn. Bi tîpên mezin li ser hêtên kulûbê hatibû nivîsîn ku Tirk bahoz e! Tirk birûsk e! Li jêr hema bi rê ve dîrekên têlên erda mayînkirî ji hindama qereqola Kewke heta ku diçû Nisêbînê, yek di ber yekî de çikandîbûn. Gundê Qesra li jêra Îpekê dima. Navbera gund û qereqolê latek erd ne digirt. Dêrûdorên gund bi têlên ristîn rapêçayîbûn. Ji vî gundî bi tenê rêyek derdiket. Rêya gund di ber deriyê qereqolê re derbasî ser Îpekê dibû. Li jêra têlan mayin û li jêra mayinan jî rêya trênê bû. Trên di hidûdê Binxetê re derbas dibû. Li binya hidûd gelek gund hebûn. Eskerên Sûriyê têkilî hidûd ne dibûn. Eskerên tirk hidûd diparastin. Di vî warî de selahiyeta wan bêsînor bû. Heta carina xwe berdane gundên binya hesin, di van gundan de bi mebesta qaçaxê hin mirov girtine û di nava mayinan de kuştine. Eskerên Sûriyê şelû ne dibûn. Di sala 1967an de gava eskerên tirkan êrîşî ser qereqola Doda dikin, Hemîdê hezexî digirin û di qereqolê de dikujin, ne eskerên Sûriyê

desthiltînin û ne jî dewleta wan bi xwe bersivekê dide dewleta Tirkiyê. Gelek bûyerên wiha çêbûne. Û eskerên Sûriyê jî tu carî li xwe ne qewimandine.
Zorava û Sirêçkê diketin bakurê qereqolê. Besta ku ji Herbê destpê dikir, di binya Cinata re xwe berdida Hebîsê, Kurikê, Sitilîlê û di ber Atxê re dihat, di navbera van herdu gundan re derbas dibû. Gund di nêzîkî hev de hatibûn ava kirin. Di roavayî Sirêçkê de tibabê
6

kîlometroyekê dûr, oda axayê sarinciyan xuya dikir; hema bi Sarincê ve Pîrebokê an jî Gundik û Kuçûka dihat. Şêxderbik, Gundikê Evdirehman, Gundikê Semho, Domiza û Darê jî li roavayî Pîrebokê û Kuçûka dima. Gund hemû bi ser hev ve bûn. Menderê li jêra Zorava ji aliyê rohilat hinekî ber bi başûr de dima û bi qasî beza yextiyarekî nêzîkî hev bûn. Çûva tam di rohilatî Menderê de ava bûbû. Herdu gund jî hema hema bi hev ve bûn. Şivanekî temam, bi kevirê koçanîkê xwe ji Menderê dikarîbû çûvayiyek birîn bikira. Dêrê, Dala, Cibiltînê, Bamidê, Xirbê Hinarê, Xirbê Zil û Eferê diketin rohilatî Zorava. Di nav van gundan de gundên ji hidûd herî dûr Xirbê Hinarê, Şahbanê, Xirbê Zil û Eferê bû. Pênc, şeş kîlometroyan ji hidûd dûr bûn. Zivingê, Atxê, Qûzo û Gurik li rajorî Zorava di çiyê de diman. Gundê ku ji hidûd hinekî dûr diket Gurik bû. Ew jî qey hemû heft, heyşt kîlometro digirtin. Bi tevayî xelkê van gundan hemû jî xal û xwarzê, ap û birazî, dotmam û pismamên hev bûn. Ên mayîn jî pisêpismaman bûn. Bi giştî ji hev dizewicîn. Dotmam a pismêm bû. Bira dimir, jinbir bi birayê din dima. Zilamekî dikarîbû bi deh, duwanzdeh pîrekan re bizewiciya. Lêbelê herçi pîrek bû, tu carî nikarîbû bi du zilaman re bizewiciya. Zilamê ku zewaca xwe nuh dikir, cotek qundere û bedlek jê re dihat kirîn. Û pîreka ku li ser zewaca

bi du zilaman re hema piçikekî bifikiriya, demaçe di serî de vala dibû. Çimkî li gor wan a ku zilêm dikir exlaqî û a pîrekê jî bêexlaqî dibû. Di civatê de navê zilamê ku li dor pîrekê digeriya bi tolazî û ê pîreka ku li dor zilêm digeriya jî bi qûnekî derdiket. Herdu jî sûc bû. Lêbelê zilam bi çend qurûş pere cirm dibû û pîrek jî dihat kuştin. Zilêm di civatê de dikarîbû bi haweyekî serbest behsa çûna xwe a kerxanê bikira, lê pîreka ku di ber deriyê kerxanê re derbas bûba, di devê wê de demaçe vala dibû. Dema lawik çêdibû dawet li dar diket; ku keçik çêdibû şîn û girîbû. Li vê herêmê mirovên xwedî du, sê û çar jin gelek û ên xwedî yanzdeh û duwanzdeh jin jî kêm kêm hebûn. Civatê ji ber ku li dinyayê nêr temaşe dikir, diruvê pîrekê bi hertiştî dixist û bi lebatekî wê bi nav dikir. Civak nêr û dînê civakê nêr bû. Heta li ba wan navê Xwedê jî nêr bû. Lêbelê ev jî hebû:

Di nav xelkê omeriyan û bi giştî jî di nav bûblaniyan de pîreka ku bi ser pêncî diket, wek her zilamî dikarîbû di civatê de rûnişta. Li gor terbiya islamê, pîrekê tu carî nikarîbû di nav koma zilaman de cih bigirta û wek zilaman bipeyiviya. Mihemed û xelîfên wî ev yeka ha li ser navê Xwedê lê qedexe kiribû. Lêbelê sitilîlî û bûblaniyan jî ev zilma islamê tu carî qebûl

7

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

ne kirin û bi pîrekê re rûniştin. Heta li Zivingê di sala 1955an de Fesla Enter kiribûn muxtarê gund û li gundê Gurik jî Emîna Ehmê bûbû mela gund. Ji %90ê stilîlî û bûblaniyan tu carî tam misilman ne bûne. Ya jî mirov bibêje ku wan li gor xwe misilmaniyek saz kiribû, belkî bêtir di cih de be. Mizgeft çêdikirin mele ne dianîn gund. Mele bianîna, mizgeft çênedikirin. Merş û alavên di mizgeftan de didizîn. Diçûn hecê nîv-sofî, ji hecê vedigeriyan limêj ne dikirin. Bi Xwedê û pêxember re li ser sicadê

dikufirîn. Û dûv re jî limêja xwe dikirin. Şêx dianîn gund, tobe ne dikirin. Rojî digirtin, limêja eydê ne dikirin. Hinan jî rojî ne digirtin û limêja eydê dikirin. Hinan di meha rojiyê de bi sibehkî re perde didan ber pacan, hindur reş dikirin, têr dixwarin û niyeta xwe li rojiyê dianîn. Sofiyên wan ên herî dîndar jî di hindurê mizgeftê de bi jinên xwe re radizan. Li ba wan sofitî remza minafiqiyê bû. Hin ji wan gava ku bi cen-abet dibûn, xwe di hewşa mizgeftê de li ser nahşê miriyan helal dikirin. Pirên wan gava diçûn omeriyan destlimêj ne digirtin û limêj dikirin. Dema ku limêj dikirin jî »Bismillahirrahmanirrehîm« digotin û »Eûzûbîllahîmînelşeytanirrecîm« ne digotin. Sûnda wan ji Quranê bêtir bi Mishefa Reş bû. Agir pir miqedes didîtin. Di rojên înan de li hin gundên omeriyan hêk û mirîşk ji gundiyan distendin û beşdarî xutbên wan dibûn. Sibehan pere diavêtin kozika ziyaretê û êvaran jî perê xwe di-anîn. Henekên xwe bi ziyaretê dikirin. Ji aliyekî de miriyên xwe gor dikirin û ji aliyekî de jî bi wan re him dikeniyan û him jî sohbet dikirin.
Di civatê de devjenga li ser islamê serbest bû. Islam li ba wan pir bêqîmet bû. Herkes bi melan re dikarîbû li ser qencî û xerabiya islamê û xwedayê wê bi rehetî bipeyiviya. Li gor islamê zekat li mitirbên kurd ne diçû, ew jî ji bo ku muzîk, govend û dîlana kurdî li ser ligan dihiştin. Lêbelê xelkê herêmê jî ji feqe û melan bêtir zekata xwe dida mitirban. Bûblanî ji êzîdiyên derdora Wêranşahirê û Dêrika çiyayê Mazî bûn. Pêşiyên wan, li gor ihtîmala herî mezin, çûvî bûn. Çûvî eşîreke mezin bû. Eşîrê ji Qerejdaxê heta ku digiha wêranşehirê, Dêrikê û hidûdê Sêwregê cih girtibû. Eşîr bi carekê ve êzîdî bû. Dûv re çend bavik jê dibin fileh û bi dû filehtiyê de jî hema hema hemû dibin misilman.
Li dor sê sed salî çêbûbû ku bûblanî hatibûn derdora Nisêbînê. Li vir dibin du beş, beşek di bin pozê omeriyan de bi darê zorê cih digire û beşê din jî ber bi çiyayê Şingalê de diçe. Li gor tefsîra axê bûblaniyan omerî û

eşîrên herêmê ji wan re « Bûn-bela« dibêjin û ev nav di herka zemên de dibe Bûblanî. Heta pêncî sal berê jî têkiliyên axê bûblaniyan û êzîdiyên
8

Şingalê bi hev re hebûn. Ji hev re digotin, »Pismam.« Pisê pismamên Sarê jî di nav wan êzîdiyên Şingalê de hebûn. Lêbelê têkiliyên wan û êzîdî, fileh û misilmanên çûvî ji hev qut bûbûn. Taybetmendiyek din a sitilî û bûnlaniyan pir henekçî û ewqasî jî xeberokî bûn. Û xeberên wan jî wek şekir şêrîn bûn. Di vî warî de hin ji wan pir li pêş bûn. Ewqasî xweş digotin, pîrekên pîr û zilaman ew bertîl dikirin ku bi wan re hema siqêfek kiribana.
Wek li temamê gundên herêmê, li Zorava jî berberî hebû. Ji gundên din bi tenê belkî ferqa zoraviyan ew bû ku berberî bi haweyê du bendan digeriya. Çimkî bi giştî di her gundî de sêbendî, çarbendî û pêncbendî hebû. Û hemiyan jî bi hev re xirecir û şer dikirin.
Pizûrî hemû li taxa jorê diman. Gund sê tax bû. Rêyên kolanan ji ser hev qut kiribûn. Ne ji jorê kesek dikarîbû daketa jêr û ne jî ji jêrê kesek hilkişiya jor. Mercên ku Circîs û Heso danîbûn pirole dijwar bûn. Li vî gundî têkilî û hevkarî qedexe bû. Pîrekên terefan nikarîbûn digel hev biaxiviyana; qedexe bû ku zarokan pev re bilîstana. Her hêlekê çend tenûrên xwe hebûn. Du gavan û sê şivan di gund de hebûn. Heta bi ava ku ji Sitilîlê diherikî birka gund, li hev hatibû parkirin. Birka avê ji danê sibehê heta ku seet dibû duduyê rojê di mista benda pizûran û seet ji duduyan heta sibehê jî di mista benda hûran de bû. Gol û sarinca gund ew jî bi dorê dihate bikaranîn. Pez bi dor dianîn ser avê. Bi dor diçûn cilşo yê. Tahta birxulan havînan herhefte wê dest biguherta bûba malê bendekê. Her hêlekê du cot destarên xwe hebûn. Berî ku terempêl têkeve gund, heta bi aş û darteraşên Sitilîlê li hev pişk kiribûn. Yanî benda ku

dan û sitendina wê bi kîjan aşî û darteraşî re bûbûya, benda din têkiliyên xwe ji wan dibirî. Elba gund bi tevayî bi kar ne dianîn. Herdu bendan jî elbek xwe hebû. Di vî gundî de yekaheng, tu tişt tune bû. Dema elba genim li taxa jor bi bîst û heft wereqeyan bihata firotin, taxa jêr wê ev sêr têk bibira, elba genim daxista bîst û şeş wereqeyan. Çiyayiyan ji vê qayişê fêde dikir û qerfên xwe bi berîvaniyan dikirin. Lêbelê berîvaniyan jî ji qayişa nav wan fêda xwe didît û henek û laqirdiyên xwe bi wan dikirin. Mewîj, dims, bastêq û êzing erzan dikirîn. Heso CHPî û Circîs jî APî bû. Li ser van herdu partiyan jî di rojên hilbijartinan de çend carekî şer kiribûn. Heso paşnavê xwe û malbatê kiribû »Kaplan«, Circîs jî ê xwe û malbatê kiribû »Aslan.« Tiştekî wan ne dişibiya hev.
Bacanfiroşên Newalê ji ber ku bi rewşa gund dizanîbûn, bi çar cembiyan ve zozo dihatin gund: Yekî barê xwe li taxa pizûran, yekî jî li taxa

hûran datanî. Bacan û tirîfiroşên Newalê mîna kose û berkosan li xelkê gund dikirin. Dema koseyekî ji taxa jorîn bang dikir û digot, »Ha werin bacana ser bi ser!« Kosê din li taxa jêr bang dikir, »Ha werin bacana, du ser genim bi serek bacan!« Îcar kosê ku li taxa jor bû wê dev biguherta, sêra berê betal bikira û wî jî dikir du ser genim. Kose û berkosan carina bayê sêrê pir radikirin. Li vî gundê serpiçûk, gelek caran serek bacan bi çar ser genim firotine. Terbiya Circîs û Heso rê dida hemû babetên şelihandinê. Xwe mecbûr didîtin. Gava li gor sêra kosan bi kosan re nemeşiyana, bêguman kose wê li taxekê biciviyana. Lêbelê kêmanî dihat ser taxa din. Nemaze ev kiryara ha jî, wê di nav benda din de, destûra peyrewî çikûs û qelsok bihata dîtin. Bi kurtî, li vî gundî hertişt di rengê belayê û xerabiyê de ava bûbû.

Heso û Circîs bûrayên hev bûn. Pêşdestiya malbata pizûran di destê Heso û a hûran jî di destê Circîs de bû. Gotinên van herdu mirovan di nav malbatê de wek ên pêxemberan bûn. Malbat ji gotinên wan dernediketin. Tarîxa dijminatiya malbatan ji kevin de dihat.
Kalikkalikên Circîs û Heso pisên pismaman bûn. Li gor ku digotin, ev mirov rojekê bi siwarî digel hev diçin nêçîra xezalan. Li hindama Amûdê di nav qendirxan de xezalekê dikujin. Laş tînin malê û li hev pişk dikin. Hûr û pizûr li aliyekî goşt û serûpê li aliyekî goşt datînin. Hûr û pizûr pişka Xido dikeve. Kido li gotina xwe diqulipe vê yekê qebûl nake û dibê-je, »Hûr ji min re pizûr ji te re« Xido bi xwe ne xweş tîne. Gotin gotinê dikişîne, radibin hev. Xido Kido dikuje û dijminayî dest pê dike. Xelkê herêmê ji bavikê Xido re »Pizûran« û ji bavikê Kido re jî »Hûran« dibêjin. Li herêmê gelek navên wilo hebûn. Navên wek »Mala Kezebo, Mala Serûpêyan, Mala Çermo, Mala Simo, Mala Teneko, Mala Qerase, Mala Zirzopan, Mala Şotiran, Mala Hotiran, Mala Dimso, Mala Mewîjo, Mala Meyiro, Mala Masto, Mala Terîşo« bi giştî li nav omerî û toriyan civiyabûn.
Bi kuştina Kido re, kuştin ji kuştinê vedikeve heta ku digihê bavê Heso Rûto û bavê Circîs Şûto.
Rûto û Şûto bi armanca ku neyariyê ji nav xwe rakin, qîzên xwe berdêlî dabûn hev. Xweha Heso Perîxanê jina Circîs û xweha Circîs Sarê jî jina Heso bû. Lê mixabin wê ev dostaniya wan dom neke û li ser çima ku mirîşk û elok ketine ziyanan, Şûto Rûto bikuje. Bi kuştina Rûto re sereketî derbasî Heso û Circîs dibe. Van herdu malbatan ji dewra ka-likkalikan heta dewra Heso û Circîs bêwestan bi hev re berberî kirine. Di
10

vê berberiyê de bîst û heft mêr birîndar dibin û nozdeh mêr jî tên kuştin.

Ji bîst û heft kesên ku birîndar bûbûn, sêzdeh jê ji ling, zend û piştê seqet dibin û neh jê jî, ji derba ku ji serî xwaribûn tirodînî dibin.
***
Şeveke reş û pir tarî ye! Ji reşaya şevê, çav tiliyên destan ji hev nafesilînin. Hawêrdor ba û bahoz dixurbile. Rewşa şevê ji êvar de xuya kiribû. Bi êvarkî re teyr û tilûr li şêniyan vehewiyabûn; di kulek, derî û taqan re xwe avêtibûn hinduran. Çilapekên baranê rû çipîsk dikin. Dar û devî dihejhijin. Tayik tewiyane, şaxên tayikan taht û latan dimalin. Ewrên weke qîrê reş di ser hev re dikelin, perên ewran xwe berdane ser kavilên gundê Zorava û her der di nava reşayê de xerq kiriye. Ji qir û seqemê, guve guva bayê reş û bapêşkên ku li borangehan dixînin, kevokan xwe bi ser hev de qurnisandine. Gur paşpûk bûne û di ber pêlên bagerê de disûrikin. Hirç, keftar û çeqelan di qorzîbirên kunan de xwe qoçandine. Kûçikan gasîn û kolanên gund ji guran re berdane û xwe avêtine taldên tenûr, tifik, pang û hefşoyan; serê xwe xistine nav lingên xwe, dinya biqîre jî ew taqet nakin ku ji cihê xwe rabin. Dizên herî bi nav û deng di vê şeva reş û tarî de nikarin sewêl ji hewş û axuran bidizin. Di bejayê de, ne çirûskek xuya dike û ne jî pêjina rihberekî tê. Ezman bêwestan pêdikeve û vedimire. Li jêr mîna ku hertişt sekiniye û li jor jî hertişt heralî di hereketê de ye. Ezman erdê dilerizîne. Tu dibêjî qey du ordî bi balafiran li hev didin, gire gir bi ezmên ketiye û agir bi ser dinyayê de dirije. Dinya bi temamî teslîmî ezmên bûye.
Heso hîn ji êvar de dilerizî, ketibû tayê. Bûka wî Meyro li ber sobê doşeka herî qalind jê re raxistibû û du lihêfên hirî bi ser dakiribûn. Meyro pir hej xesû û xezûrê xwe dikir. Qedir û qîmet dida wan.
»Lawê min Temo, ma te pez êm kir ku tu xwe wilo di nav livînan de vediparimînî?«
»Erê yabo.«

Heso destê xwe yê rastê ji ser nava xwe hilanî xist bin serê xwe û bi destê xwe yê din jî, bi guhikekî lihêfê girt. Bi herdu lingan hêdî hêdî lihêf ji ser ruyê xwe avêt û kabok ber bi xwe de kişandin. Pêşî çav kutkutandin û serê bêvila xwe xwirand. Dûv re dest bi hev firkandin, tilî hemû sipartin hev; kirin wek aqida qesiran û herdu tiliyên girdikê heta bi movikan ajotin qulên bêvilê.
»Lawê min Temo, ma te dewar jî êm kirin?«

11

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Temo bi tena serê xwe dîwarê êxur lêkiribû. Pir westiyabû. Baranê ji hêla bakur de li ser du maxan dîwar hilweşandibû. Ne dixwest kesek pê re bipeyive, da ku deqîqeyekê berî deqîqeyekê rakeve. Temo xwe ji ser kêlekê qulipand ser piştê, ziq li bin zikê xênî nerî, xwêziya xwe daqurtand û piştî ku bi dengekî hêdî got:
»Erê yabo, min dewar jî êm kirin«, bi hêrs serê xwe xist bin lihêfê.
Heso li qûn rûnişt, pelxemek di tifika ber sobê de werkir û berê xwe dayê:
»Lawê min, ma te çawa kir ji wê bergîlê?«
»Yabo ez xulamê te bim, de bihêle ez hinekî ji xwe re rakevim, hê! Min alifê bergîlê jî tije ceh û ka kir. Min pez yek bi yek hejmart; tam çil bizin û pêncî û neh mîh, du nêrî û sê beran niha li êxur di ser êm de ne. Fehmîko kerî tebût gihandiye malê. Guran tu pez ne kuştiye. Min dewar bi êm kirin. Min pênc rêsî ji hev feşkilandin û danîn ber keran. Min xwa-rina kûçik jî dayê. Ma ne bi Quran ez ji te re çi bibêjim tu ê hey dîsa here yek bi yek wan heywanan saxtî bikî. De îcar ez qurban bihêle ez ji xwe re rakevim.«
Heso gebirê ku li serê xwe gerandibû bi hêrs avêt nav şekalan, kulmek

dawişand doşekê, rimekê çeng bû û qêriya:
»Lawê kûçik gotinên min bi xwe ne xweş tîne, hi!« û li ser çarlepikan ber bi derî de meşiya.
Bêî ku fitîla lempa hûrkirî hilde, li reşayê destê xwe li şekalan pelikand. Çep û rast du şekal bi serê lingan ve danîn, bi herdu destan qeweta kelaxê xwe hemû berda ser kabokan, »Ya xwedayê ezîm« got û hilda xwe. Şerwal
jê herikî. Heso mîna ku qebheteke mezin kiribe di cih de çong berdan erdê, xwe wek teyrikekî melisand û xwe bi ser hev de guvaşt. Serê xwe wek ê dizan bi dizî bilind kir, li hindama ristila genim ku kuflet lê radiket, kûr nerî û hûr xurbiland. Wek jojiyê ku carina wî digirt û dixist nav teş-ta avê û jojî bi ketina nav vê avê re wilo yekser xwe ji nişkê ve vedikir, şer-wal heta ku li ser çiçikan sekinî kişand xwe û doxîn hişk zeft kir. Piştî ku doxîn bi sê girêkên kwîr girêda, hîn nuh bêhna wî hat ber wî. Lingên xwe radan, şeqên xwe ji hev vekirin û bi serê lêvan got, »Ya rebî tu xefûr û rehman î, kufletê min ez di vê rewşa xerab de ne dîtim...«
Heso selewat ne qedandibûn Meyro ji dera ha bang kir:
»Apo deng ji te nayê, ma çi bi te hat?«
»Weh, keçê Meyro, tu hîn ranezayî qey!«
»Na apo.»
12

Heso piştî ku ji Meyro re bi dengekî hêdî got, »Razê qîza min razê, êz ê niha herim êxur û bêm«, rabû ser xwe meşiya û xûz li ber derî sekinî. Hindur ji xwe reş bû; reşaya hindur û derve jî bi carekê ve xwe berdabû ser hindama derî. Mîna ku şîfika derî didît, devdevkî pala xwe da derî şî-fik kişand û bêmefer xwe avêt derve. Pala xwe da dîwêr û li hindama qereqola hidûd temaşe kir.

Di ezmên de guhertineke ber bi çav çênebûbû. Her der mîna teniyê reş bû. Bahozê ji ser sêncan hej diqulipandin hewşan; reqe reqa camên şibakan bû. Heso ji şevê xof girt û bi lez hat hindur.
»Meyro Meyro qîza min, ma ne îro sept bû, Reşo ji mektebê hatiye ge-lo?»
»Na, Seydo hatiye.«
»Wey mala Xwedê ava ku ne hatiye! Lêbelê Seydo çima birayê xwe bi tenê dihêle û tê malê? Sed beleyên dinyayê hene. Bitenêbûn ne baş e.«
»Apo hewce nake ku ez ji te re bibêjim, tu dizanî bê exlaqê Reşo çawa yî. Emirqesifiyo dîsa çûye sînemê.«
»Bila Seydo jî biçuya sînemê« got û menqela êgir ber bi doşeka xwe de kişand.
Çarmêrkî rûnişt. Destê xwe dirêjî bin qiraxa doşekê kir. Li qutiya tût-inê digeriya. Xofê dilê wî diguvaşt. Ricfê ew bi carekê ve zeft kiribû, mî-na bajenê dilerizî. »Belkî bi kişandina çixarekê ez hinekî bi ser xwe ve bêm û bikaribim aqilane bifikirim«, di nav lêvan re wişe dipengizîn. Qutiya çixaran bi herdu destan hişk zeft kir û herdu kêlekên qutiyê ber bi hev de dewisandin. Qutî venebû. Bi serê nenûkan hilqerast, qutî vebû û bi lez destê xwe li çixara herî qalind gerand. Rahişt çixarekê û xwe bi ser men-qelê de tewand. Lihêf bi ser pişta xwe dakir, bi guhikekî lihêfê girt, hilmek dirêj li çixarê da û bi dengekî kelûgirî got:
»Pir baş ket, pir pir baş e ku ev lawik îro ne hatiye malê!..«
Meyro:
»Apo Xwedê xêr bike, îşev çi hewala te ye? Mirov ji gotinên te ditirse.«
»Ez îşev tiştekî ecêb ditirsim! Dinya reş xeriqiye Meyro! Kûçik dizûrin! Bêhna mirinê ji Zorava tê. Di şevên wilo tarî û bahozî de, her tim ya gu-ran xwe dadane hewşan pez kuştine û ya jî qaçaxçiyan li hidûd xistine. Dibe ku îşev zelzele jî rabe. Lêbelê tirsa min ne ji guran, ne jî ji zelzela ku

wê Xwedê rake; ez ji qaçaxçiyan ditirsim. Îşev tam şeva ku mirov li hidûd xîne. Hîn birînên me ji lêdana eskeran qalik ne girtine, ava serê Hemoyê bamidî zuha ne bûye û wê ev teres dîsa bigirin ser gund. Mala Xwedê ava

ku ev lawik ne hatiye malê. Reşo ji eskeran danaxwe; dikare li himber wan bê û ew jî mîna ku Hemo ji qomandarê hidûd re gotibû, 'we em bi lêdanê kuştin bes e!' tivingê di serê ê me de vala bikin!«

Meyro piştî ku keserek veda, axivî:

»Bêhna xwe fireh bike apo, xwe ewqasî netirsîne. Erê Hemo bi jin û zarok û zilam bû, lê Reşo jî hîn naşiyekî hivdeh salî ye. Ma wê çawa wî bikujin!«

»Êh aqilê wê. Ma lawê Ûsivê qesirî Ekrem ne zarok bû ku demaçe li ser kirin! Lawik çardeh, panzndeh salî bû û bêsûc û sebeb kuştin. Çima ku qomandarê qereqolê li ser rêya Çûva li hespê xwe ê hesinî siwar ne kiriye. Li Gundikê Evdirehman çar, pênc sal berê, bi bafîka ku kûçikê Biro esker didire, esker jî heyfa xwe bi kuştina Tajdînê lawê wî hiltînin. Lawik panzndeh salî bû. Niha ku ê esker har bûbaya, kuştina lêwik dîsa jî xem ne dikir. Kûçik devê xwe avêtibû şerwalê wî ewqas. Segbavan qismê nêr, piçûk - mezin hemiyan ketûber didin ber hev!«

»Tişt nabe apo tişt nabe. Înşelleh wê tu qaçaxçî îşev li hidûd nexînin. Xwe pal bide tiştê Xwedê kiriye betal nabe.«

»Rast e, tiştê ku xwedayê mezin bibêje wê bibe. Lêbelê wilehilezîm destê min di nava min de ye. Hewalek dikare biqewime. Di her şevên wilo de her tim beleyek li me qewimiye. Min dîtiye, bi serê min hatiye ez dizanim. Wilo li vî kalî menere ez ji serî heta binî tecrûbe me. Qaçaxçî çawa mêr in, ez wan xweş nas dikim. Bi giştî di şevên zivistanê de bêî ku

bertîlê bidin qomandar û eskeran, bi qeweta devê tivingê li hidûd xistine xelas bûne û dûv re jî qûncilikan êrîş anîne ser me belengazan. Keçê ma ne tu jî van tiştên ku ez dibêjim, dizanî? Her roj li ber çavên te dibin. Subhanelah qey bira ez xurifî me bavo. Min xew li te herimand Meyro. Tu kebaniya malê yî, karê te pir e û tu ê sibehê zû rabî. Razê qîza min razê, li min guhdar meke.«
Meyro piştî ku got »Apo taswasê ji xwe re çeneke, înşeleh wê qaçaxçî li hidûd nexînîn. De Xwedê rehetiyê bide te«, xwe li Temo pêça.
Heso lihêf bi carekê ve ji ser xwe avêt. Berê xwe da başûr û herdu destên xwe ber bi hidûd de dirêj kirin:
»Ji wê roja ku van bêbavên romiyan ev mayîn danîne û heta roja îro, bi bafîka qaçaxçitiyê ezabên giran dane me, temamê gundên ser keviya mayinan û xelkê mentîqê. Gava ku Dawidê Osmên hat kuştin tu wî çaxî di pêçekê de bû, qîza min. Û ez jî xortekî di benga xwe de lihevhatî, pir bi difr û paye bûm. Şeveke havînê bû. Em li ser bên radiketin. Xweş tê
14

bîra min. Tê bîra Sarê jî. Xanim wî çaxî bûk bû. Malikviritiyê hîn ji wan deman de wilo bi ecêb radizê. Di bûkaniya wê de min ev xewa wê ne dikir tiştek. Bi ketina ku em diketin nav livînan, ecêb nedîno ev jinik hema pê re di xew re diçû. Min digot qey aşiqî min bûye, dilê wê xwe li ber eşqa min nagire, dil bêhiş dikeve ji ber vê yekê zû di xew re diçe. Lêbelê di dûv re min fêm kir ku jinik xerabe ye. Tu têkiliya xewa wê û eşqê bi hev re tune ye. Ji maka xwe de ev mal e. Niha mirov top û tematêkan jî li ber serê wê biteqîne, bi Xaliq wê dîsa jî şiyar nebe! Qîza min Meyro, ez li ku derê mabûm, min çi digot? Ma tu li min guhdar dikî?«
Heso di vê navê re çixare ji çixarê pêdixist. Ji kûraya dil û kezebê keser vedidan. Bêwestan hilm li ser hilmê dikişand û di nav gotinên xwe re yek-

liban ditewirand. Mîna ku nava rojê ye hertişt jê diyar e, dîsa eskeran girtine ser gund, piçûk û mezin hemû derxistine ser bênderan, zilam şilfîtazî kirine û bi dar, qûndaxê çapiliyan û qezetoran belişîne ser wan, bi haweyekî wilo behetî di kulekê re ziq li jêra gund temaşe dikir. Derdorên hindur mîna ku şemedankirî be û xanî yekser bi qîrê hatibe seyandin, hîç hewê nastîne ku wilo genî bûbû. Ji dixana çixara wî wexmeke agirê serkulan dida pozê mirov. Zarokan lihêf ji ser xwe avêtibûn. Temo di nav xwêhdanê de mabû. Sarê di nav livînan de herwiha xwe bi ser kêlekan de diqulipand û bêvila xwe dixurand. Nêrgiz di himbêza Meyro de digiriya. Meyro şîr didayê, lê dîsa jî her ji kêlîkekê qîr didan.

»Apo, te çêlî kuştina Dawidê Osmên dikir.«

»Hey rehmet li dê û bavê te be, erê qîzê min çêlî wî dikir. Heyvreş bû. Seet li dor yekê şevê bû; û hema me dît ji nişkê ve li texma hidûd bû qîr û qiyamet! Mîna ku tu çewalek xwê biavêje tenûrê, wilo fîşek teqiyan û dormedor ji hewa de gule bi ser me de bariyan.

Xelkê zarokên xwe ji ser xaniyan revandin hinduran. Lêbelê ez ji ser xênî ne hatim xwar. Qaçaxçiyan nav di xwe didan. Dengê navtêdanên wan mûyê laşê min bi carekê ve kiribûn mîna perên sîxuran. Dengê yekî ji wan mîna kewê ribat li ên hemiyan ferq dikir û digot, 'îşev şeva me kurmancan û eskerê tirko ye, lêxin! Lê lawo, heta ji we bê tivingên xwe ber bi

hewa de berdin. Wan nekujin ku ew jî van gundên dor xetê neşewitînin...' Di wan kêlîkan de wilo diket serê min ku hema ez jî rahijim tivingê û xwe berdim nav hofka şer, da çend eskerên qûncilik bikujim. Hingî ku dabû dilê min. Hîn jî wilo me. Ez wê şevê heta sibehê ranezam. Min dizanîbû bê wê di sibehê de çi bi ser me bînin. Min dikarîbû xwe ji

ber lêdanê bida alî; lê mîna îro hîn ji wan deman de navê temamê gundiyan li ba teresan qeydkirîbû. Ew ê bihatana gund yek bi yek navê me hemiyan bixwendana û ez ê jî ne li gund bama. Wilo ne dibû. Wê hertişt di situyê min de bima. Dawiya vê yekê jî kuştineke pir pîs bû! Şeva ku dîsa qaçaxçiyan bi teqîn li hidûd xistin, di wê şevê de Dawidê Osmên li Nisêbînê mêvanê xezûrê xwe bû. Hîn ne zewicî bû, bi dergîstî bû, bêmirado. Ê ne te ne dît bê çi xortekî delal bû! Di temenê Temo de bû. Temo bi sê mehan jê mezintir bû. Dawid mirovekî pir bi edeb û kemlan bû. Di salên ku me û Circîs berberiyeke dijwar bi hev re dikir û me hev dikuşt, vî lawikî tu carî xwe ne da terefekî û dijminayî bi terefê din re ne kir. Lêbelê kuştin. Kuştin lê çawa kuştin! Li Nisêbînê cemseke tije esker digire ser mala xezûrê wî û hay û bayê Dawid jî ji tiştekî tune ye.
Xwedê mala Osmên bivirîtîne, xwe li ber lêdanê ne girt, di lêwik hilda û lawik da dest.«
»Ma we nikarîbû qasidek bişanda Nisêbînê ku Dawid xwe ji wir bida alî?«
»Na qîza min na. Ma qey îro jî em dikarin gelo? Wê demê jî mîna îro bi sariya sibehê re derdorên gund zeft dikirin û ne dihiştin ku çîçikek ji gund derkeve. Îro di gundê Sitilîlê de du, sê terempêl hene. Di wan deman de terempêl jî tune bûn. Him terempêl hebana wê bûba çi, wey li vî aqilê min be! Ez jî bi xwe nizanim çima carina ez wilo xeşîm dipeyivim. Hîn ji berê de, bi şev çûn û hatina terempêlê bêî emirê qomandarê qereqola hidûd qedexe ye. Ma ne tu jî dizanî keçê. Qey nayê bîra te şeva ku Celîlo ji eskeriyê hatibû gund, eskerên hidûd dabûn pey wî û ew û şifêrê texsiya ku ji Mêrdînê kirê kiribû, di hindurê malê de bi lêdanan

tirek kiribûn?«
»Erê erê apo, wilo bû.«
Nêrgiz di himbêza dayika xwe de di xew re çûbû. Meyro bi hêdî memi-ka xwe ji devê lorîkê kişand û lorîk xiste dergûşê. Bêî ku bi qerpalekî an bi kincekî lorîkê binixumîne, xwe ji ser dergûşê da alî. Hêsirên xwe bi qutikê Temo paqij kirin. Destê xwe ê çepê da ber ruyê xwe û got:
»Apo ma bi rastî Xanê li ser Dawid xwe avêtibû bin trênê?«
Heso ji bilî Sarê hej tu pîrekê ne dikir. Kêfa wî ji wensa wan re hîç ne dihat. Lêbelê gava ku tirs jî lê peyde dibû, bi zarokan re jî dikarîbû bi-wenisiya.
»Wilehî nizanim. Lêbelê dihat gotin ku Dawid û Xanê pir ji hev hez dikirin. Ser bextê xelkê be. Îcar qîza min eskerên tabûra Nisêbînê Dawid
16

di hindurê malê de qepaçe digirin û wî rast dibin tabûrê. Li tabûrê tam şev û rojekê lê dixin. Piştî ku Dawid dikujin, îcar termê wî tînin li texma gundê me diavêjin nav mayinan. Of qîza min of! Ev ne misilman in, kafir in kafir!! Bawer nakim ku kafir bikaribin zilmeke wilo ecêb di serê mêrê misilman de bikin! Ronîvro û qiçe qiça germa havînê bû. Wawîk li ser cendekê Dawid kom bûbûn û cendekê wî ji hev vediçirandin. Gundiyan bi dûrbînê lê temaşe dikirin. Ez bi xwe wê rojê tam sê caran bi ereba hey-wanan çûm Nisêbînê û hatim; da ku ez ji nêzîk de cendekê Dêwid bibîn-im û çend fatîhan li ser rihê wî bixwînim. Hey mala min! Gava di cara pêşî de ez di ber term re derbas bûm, wawîkan hinavên wî bi carekê ve xwaribûn û milekî wî revandibûn. Di cara duduyan de, li vegerê serî ji gewde kiribûn û kelax dikevaştin. Di cara sisêyan de min nema dikarîbû taqet bikira ku min berê xwe bida mextela bêmirado. Îcar bi ser vê ecêbê de tew bêbavan him ezabekî mezin dan me hemiyan û him jî Osman li

dor sê salan hepis kirin.
»Ma qey apê Osman an Dawid qaçaxî dikirin?«
»Na qîza min na! Li vî gundî kesî tu carî qaçaxî ne kiriye. Heta çend kes ne tê de, ji gundên dor me bi xwe jî kesî pîş bi qaçaxiyê ne kiriye. Ên ku vî tiştî dikin, bi giştî licî, qubalî, meşkînî, xursî û çend kesên omerî ne. Ax ji destê van bêbavên liciyan! Ê ne tu nizanî bê ev licî çi pêxwas in! Ji bo wereqeyekê dikarin mala mirov bi a xwe re biviritînin! Diyarbekirê li terefê dinyayê ye, Licê jî ji Diyarbekirê bi wirtir de ye û segbavan tên heta vê derê qaçaxê, kuro! Esker û polîs wan yek bi yek nas dikin, bi wan re deng nakin, lê tên me! Gelek caran hin serekên qaçaxçiyan girtine û dîsa jî berdane. Me jî nas dikin. Yanî bi me dizanin ku em qaçaxiyê nakin. Û dîsa jî tên malên me talan dikin, li me didin û me dikujin!«
»Baş e, ev esker û polîs gava bi rastî van qaçaxçiyan nas dikin, wî çaxî jî gerek êrîşa xwe neanîna ser me. Bila herin wan bigirin û wan bikujin. Ma gunehê me çi ye?«
»Rast e, eyn wek te ye. Lêbelê ez jî tam esasê vê yekê nizanim. Qey ji ber ku em kurmanc in û dilxwazê Berzanî ne.«
»Ma ne licî jî bi kurmancî dipeyivîn apo. Min çend kes ji wan dîtin.«
Gotina wê li hesabê wî ne çû. Destê xwe hejand û dengê xwe hilda:
»Îcar çi yanî! Circîs jî bi kurmancî dizane, diya minê...«
Meyro mîna ku bêusûliyek kiribe, di cihê xwe de sar bû. Xwe bi ser hev de guvaşt û bêdeng sekinî.
Giraniya zilma salan û reşaya şevê xwe li hev badabû, mîna çiyayekî

17

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

xwe berdabû ser dilê Heso. Dixwest rakeve; lêbelê zilmê xew lê heri-mandibû, nikarîbû raketa. Çavên xwe digirtin, lihêf li serê xwe dipêça

dixwest xwe ji temamê kayinatê bêrî bike da tiştek neyê bîra wî û bikaribe razê. Dîsa jî xilmaş ne dibû. Şev qar bûbû û her der bêpêjin bû. Xofa zilmê canê wî yekser zeft kiribû, te dest dabayê ew ê biketa.
Kabokên xwe xistin zikê xwe, destê xwe ê rastê da ber ruyê xwe û di dilê xwe de got:
»Dengê kûçikekî hema bihata min, belkî hinek cesaret bida min; belkî ji min re bûba wens bêhna min pê derketiba. Çêleka ku îro çar roj golika wê mirî çêbûbû û her kêlî dioriya çima naore? Bergîl naşîhe. Ya herdu kewên Temo çima yekliban naxutxutînin?«
Kelax teviziye, lê mejî ketiye newala guman û xumanan bûye çipik; kelax mîna hejekî bi dû xwe vekiriye, diyar bi diyar digerîne û di bîr û çal û koncalan de werdike. Zemên xwe jê re şilfîtazî kiribû û xwîn dinisiland. Kelaxê Restem bi dîrekê telefona qereqola hidûd ve didît. Dengê kekê wî Cibran ji guh ne diket. Gava ku eskeran bi êvarkî re Cibran ji gund biribû û Cibran di nav lepên wan de melûl melûl digot, »Heso, Edlê li xwe mahr bike ku zarokên min di nav destan de şerpeze nebin« û jina wî bi qîr û hewar xwe diavêt lingên komutanê tabûra Nisêbîne ling maçî dikirin, ew rewş bi carekê ve hatibû ber çavên wî.
»Ez ê çawa bi jina te re bizewiciyama kekê min?« digot, dev lihêfê dikir û digiriya. Li termê Cibran digeriya, dixwest devê xwe têxe qirikê bêhn bike û darîçavê herkesî ji xwe re têr bikira hewar û bigiriya. Lêbelê Cibran winda bû. Bi tenê qerpalekî tev bi xwîn jê mabû. Eskeran ew qerpal jî nedabûyê. Qerpalê ku bi gulan mîna bêjingê qulqulkî bûbû, bi ser têlên mayinan de wek hêsîrekî birçî dihejiya û roj bi roj piçûk dibû. »Kekê min, dilê min, rihê min ji bo wî çakêtê te ê xakî ku te pir jê hez dikir û di civatê de her tim li ser te bû, ma tu dizanî bê ez çend caran çûm wê Nisêbîna malikwêran! Ji bo ku hema terîşekê bi dest bixim, her roj, tam sed û sih du rojan çûme Nisêbînê û vegeriyame gund. Erê ey Xwedayê

xefûr û rehman ma qey bi rastî te nikarîbû bayekî xurt rakira û ew qerpal ber bi gund de biavêta! Ên me dikujin zalim in. Ma qey tu jî zalim î? Tobe estexfîrulah. Min efû bike, li min negire...«
Meyro raza bû. Nêrgiz ne digiriya. Xew li Sarê giran bûbû. Sarê mîna ku di newaleke kûr de raketî be, pixe pixa wê bû. Temo ji xwe hîn ji êvar de bêhal ketibû. Xelîl di xew de pir diaxivî û gazî kalikê xwe dikir. Devê Xelîl hatibû girêdan. Fehmîkê şivan her tim li ser dika nêzîkî tewla bergîlê 18

radiket. »Fehmîko kêm şevan diçû malê ba diya xwe. Ev lawik çima îşev ne li vir e?«
Heso ji ser cihê xwe rabû. Kurkê xwe ê erebî li xwe kir, rahişt gopêl û ber bi derî de meşiya. Li şekalan terpilî serê wî li hêt ket. Di ber xwe de, »îşev fiqiriyek ji ber min tê«, got, bi hêsanî derî vekir û xwe berda hewşê. Di ewran de guhertin ne bûbû. Her der mîna berê tarî, ba û bahoz bû. Bahozê, pûka berfê û peşkên baranê bi ser kurkê wî de dixurbiland, pişta sitû şil dikir. Heso di talda sêncê de li dor nîv seetekê guhên xwe bi ser besta Zorava de ker kiribû û li bestê guhdar dikir. Gava qaçaxçiyan li hidûd bixista, wê qaçaxçî di vê bestê re ber bi Atxê de biçûna û bi çiyayên omeriyan ve hilkişiyana.
Qurpîniyek ji dilê wî hat; xwîn lê vemirî. Dil weke pêlên deryayan rabû, xwe da qesefê û sêng nepixand. Ji taqet ket. Devdevkî bi nav pirikê de kumişî û mîna gayekî serjêkirî li wê navê perpitî. Di vê rewşê de li dor du, sê deqîqeyan li erdê gevizî. Dûv re bi ser hişê xwe ve hat, pîjaq ber bi hinavan de kişand û lêv cûtin. Xwe bi ser hev de kire gilok, ser pêyan çeng bû û bi bazdan çû hindur:
»Rabin rabin! rabin ser xwe, rabin ser xwe dîsa mala hinekan ji me vir-itî! Qaçaxçiyan li hidûd xistin, li hidûd xistin!..«

Heso her çendî bi qêrîn bang dikir, dîsa jî kes bi qêrînên wî şiyar ne dibû. Te digot qey efrîtê cinan morîka xewê xistiye guhê hemiyan ku ewqasî xew li wan giran bûbû. Heso gopalê xwe hişk zeft kir û gopal li ser gopêl li sobê û menqelê da. Toz û arî ji sobê û menqelê bi ser ruyê wî de bilind bû û li hindur belav bû. Lempa ku hûrkirî bû, vemirî. Destê xwe avêt bêrîkê rahişt çeqmêq da ku lempê pêxîne. Lêbelê ji nişkê ve, »Wey gidî ez dikim çi bikim, ma ne şewq qedexe ye!« hat bîra wî û dîsa bi gopêl dabelişî ser sobê û menqelê.
»Keçê Meyro Meyro, rabe ser xwe!«
Meyro herdu destên xwe xistibûn situyê Temo. Şeqên xwe di nav ên wî re derbas kiribûn û heta bi navikê xwe xistibû bin.
»Temo ev îşev çi bi we hatiye! Zû rabe ser xwe û derkeve derve, qaçaxçiyan li hidûd xistin, hidûd..!«
Mîna ku tu cereke ava qerisî bi ser Temo de dakî, veciniqî. Ji nav livînan çeng bû. Meyro qulipî ser piştê. Lempe vemirî bû, laşê wê ji Heso xuya ne kir. »Te got çi yabo te got çi?« Temo got û ber bi hewşê de bazda.
Bi neqebên xênî ve hilperikî, çong berdan erdê û li besta newalê guh-dar kir.

19
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Gava ku Temo li ser xênî xwe vezilandibû û li bestê dihishisî, sê qaçaxçî bi hespên xwe ve ji karwên veqetiyabûn, gihabûn qûntara çiyê û karwan jî hîn li hindama gund bi kûçikan re pevdiçinî. Kûçikên gund rê ne di-dan karwên. Karwan giran diçû. Qaçaxçî li ser baran siwar bûbûn, kesek peya ne dimeşiya. Yekî ji wan li bayê lezê bi dengekî sivik digot:
»Hiso gidî ez di bextê te de, ji bestê dernekeve; herdu aliyên bestê heta ku em negihên qûna çiyê weke binya xetê deşt e. Her der herî û teqan e.

Binere, eger vê carê jî tu nikaribî hespê xwe ragire, ji bestê dagere nav teqanê, em ê dev ji te berdin û bi rêya xwe de herin...«
Dengên axavtinên wan yek bi yek dihat guhên Temo. Yanzdeh hesp di hindurê bestê de garankî dabûn pey hev û dimeşiyan. Best teng bû. Qey deh, duwanzdeh metroyan fireh dihat. Ji nav simên hespan çirûsk diçûn. Mîna kevirê koçanîkan bi şeg kevir dipengizîn, dengekî bi hêl û mêl dida derdor. Xurîna bestê û ewte ewta kûçikan kîlometroyekê deng vedida. Temo jî herwiha di cihê xwe de çirisî bû, guhdar dikir û li texma qereqola hidûd dinerî. Lêbelê pêjin ji qereqolê ne dihat. »Wilo çênabe, çawa hûn bi wan nahisin!« di ber xwe de ditewirand û digot.
Heso bi dengekî melûl:
»Ma te çi fêm kir Temo?«
»Ma min çi fêm ne kir yabo, qaçaxçiyan bi hespan li hidûd xistine, mala me şewitî dîsa!..«
»Ma pir bûn?«
»Oho oho, zir garanek bû! Gava ez hilkişiyabûm ser xênî min li wan guhdar dikir, serê garanê gihabû çiyê û dawiya wê jî hîn li hindama qereqolê bû.«
»Te got çi, te got çi?«
»Ez dibêjim, temamê xelkê vî welatî îşev bûne qaçaxçî û li hidûd xistine, yabo!..«
»Bi telaq romî wê sibehê fermana me hemiyan rakin!..«
Heso deyl li kuflet kiribû, kuflet hemû şiyar bûbû. Mîna ku wê esker di sibehê de agir berdin gund û îşev dawiya jiyana wan e tevxircilîn, heryekî ji xwe re tiştek got.
Heso:
»Penceran qenc asê bikin û merşan bi ser perdan dakin. Pîrê, fitîla lempê girs bike ku hindur baş ronî bibe..«

Temo ji bo ku tirsa xwe nede der, li ser doşekê palda û sêrê xwe xist bin lihêfê. Eskeran bi dijwarî li wan dixist. Wî baş dizanîbû ku bi sibehê re wê 20

çi afatê bi serê wan de bînin. Meyro li êxur pez êm dikir. Pîra Sarê jî mî-na keçeke şanzdeh salî xwe di kirês û xeftên de çikçikandibû û li wê navê diçû û dihat. Pêşmalk dabû ber xwe, libade li xwe kiribû, kofiya reş girêd-abû û kofî bi ser eniyê de xwar kiribû. Bi tenê wê livînên xwe dabûn ser hev, kerş û gemara wê navê paqij dikir û navtêdan di Heso de difirandin. Jineke mêranî bû. Carina ji Heso re digot »Xwelî li sero tu jî zilam î. Gerek ê min bi te û te jî bi min ve ba. Lêbelê ez çi bikim ji vî xwedayê ku tu nêr û ez jî mê çêkirime«
Sarê ji eskeran ne ditirsiya. Heta sala ku eskeran jina Farisê qesirî ne kuştibû, wê herwiha bi wan re pevçinîbû û ji wan danexwaribû.
»Heso kuro bes bibilîne, te kuflet ji desthilanîn xist bavo, te em hemû cinoyî kirin, çi dibe bila bibe, wey bimir!..«
»Keçê Sarê ma ez ê çawa nebilînim, romî sibehê wê me bi saxî bibirêjin! Tu pîrekî ji xwe tiştek ji te re tune, ma tu ê çima van zirtan nekî diya minê. A te mêraniyeke belaş e pîrê.«
»A min mêraniyeke belaş e ha, hema aniha rabe ser xwe em bigirin ser qereqolê. Heçê ji min û te de îşev negire ser qereqolê, bila ne ji pişta bavê xwe be!..«
»Ev ne mêranî ye xanim. Dûv re wê çawa bibe tu dizanî? Êh, ew ji kû dizanî«
Heso hîn gotina xwe ne qedandibû Sarê bi dengekî nerm:
»Heso ev hezar car çêbûn ku ez bi te re vê gotinê dikim û tu jî dipirsî bê, ‘dûv re wê çawa bibe?’ Wê çi çawa bibe? Tu tişt nabe. Em ê romiyekî duduyan bikujin, dûv re ew ê jî me bikujin û weselam, ewqas. Ji roja ku

tê bîra min û heta roja îro romî vê zilmê di serê me de dikin û kesekî ji me jî deng ne kiriye. Bi me dizanin ku em qaçaxê nakin. Îcar çi! Ka carekê jî em ê çendekan ji wan bi cehnemê şa bikin belkî di cihê xwe de rûnin; nema zilmê bi me re bikin. Tu di fesadiyê de mesix bûyî, romiyekî bikuje bi Xaliq wê destê te kesk bibe û tu ê rast herî bihuştê. Ew serê te ê cimcimî û bêmix, roja ku birayê te kuştin wî çaxî te bi a min kiribûya, me ê çend romî bikuştina û em ê ji xwe re ji vê heyata bi merez, xelas bûbana. Lêbelê te bi a min ne kir. Ez di wê demê de çîrçîreke jinan bûm, li ser xwe bûm. Bi Xaliq di qereqolê de min ê ew qûncilik hemû bi ser hev de ser jê kiribana.«

»Keçê nihîta neqeban, Eliyê Betê, Hemê Gozê rê bide min ku ez jî çend gotinan bibêjim, weh!«

»Bibêje bibêje bê tu ê çi bibêjî, hey min xweliya heft gundan bi serê te

dakiro. Bibêje ka bibêje!..«

Heso û Sarê bi giştî gava ku dabaş li ser esker û qaçaxçiyan vedibû, bi devjengê qirik li hev dinepixandin. Îcar a herî balkêş, di kêlîka ku herduyan bi devjengê radihiştin hev, mîna ku ne jin û mêrê hev bin, tiştekî zêde serbest digel hev diaxivîn û rê didan axavtinên hev. Dida û distend. Ev yeka ha li gor normê civaka wan, tiştekî kilêt bû. Sarê pîrek û Heso jî zilam bû. Ne dînê civakê û ne jî civakê bi xwe, ew heq dabû pîrekê ku bi mêrê xwe re devjeng bigirta. Dema ku ji gotinê gotin pêdiket û gotinan hev disût, hema wilo pê re yekalî ya Heso, ya jî Sarê dê gotin daqurtanda û herdu hêl jî mîna gulekê vebana. Herduyan jî bi dilekî paqij ji hev hez dikir. Bêî hev xwarin ne dixwarin. Di esasê xwe de ne Sarê, Heso aşiqî

Sarê bû. Heso heyranê mêraniya Sarê bû. Lêbelê ev aliyê xwe, mîna ku wê
jê re bûba kêmaniyek, vekirî ne dida der. Dikir qerf û digot. Reşo ev aliyê wan kefş kiribû. Ji kalik û pîrika xwe fêm kiribû ku çendî mirovin, hêja nin. Li gor wî pir tiştên ku wê mirov ji wan hîn bûba, hebûn.
»Keçê romîkujê, mesele ne di kuştina çend eskerên vê qereqola pîsik de ye. Enqerê heye, Enqerê!«
»Ez, gû di devê sed bavê Enqerê jî kim, te fêm kir ne wilo! Tirsoneko ew jî ji min re zilam e, hi!«
Heso mîna ku ne ji wir be xwe xaşomaşî kir, li Temo nerî keniya û got:
»Lawo Temo serê xwe ji bin lihêfê derxe, diya te dîsa hêç bûye. Jinikê qereqol safî kir, îcar berê xwe da Enqerê jî...«
Temo li qûn rûnişt. Xwest ku biaxive, lê Sarê berî wî dest bi gotina xwe kir:
»Erê kuro ma niha hûn bi qedirê xwedê kin, ev jî hal e ku em tê de ne. Bi şev û carina jî bi ro em ê nikaribin ji gundê xwe derkevin biçin gundê din, qedexe ye. Heywaneke me wê li çiyê bimîne em ê nikaribin herin bînîn; heywanê ji guran re berdin, ji ber qedexa wan. Dîsa bi şev ne em ê bikaribin bi çirayê herin êxur, heywanên xwe êm bikin û ne jî em ê bikaribin bi elatirîkê li nav malan bigerin. Lîstika hingulîskê ji navbera gund û gundan rakirin. Şevbihêrk rabûn. Pêketina çirûskekê bê çi ye, li me qedexe kirin, weh! Qalûnkêşên me ji tirsa wan çixare terikandin. Bi şev kesek newêre çixarekê bikişîne. Em bi hesreta dîtina hespekî ne. Xwedîkirina hespan li me qedexe ye. Biharan bi terempêlên xwe didin nav çandiniya me û çandiniyê hemî dikin gêre. Ji xwe re li vê ecêbê biner-in, dibê qey em ne insan in kuro! Mastê me dixwin, heywanên me dig-urînin. Ji mentîqê bi bermîlan vikî belaş şîr didin hev. Em ji wan re penêr
22

çêdikin û dibin heta devê deriyê wan. Wey bimir, bê çi bênamûs in! Namûsa kûçikekî jî bi van romiyan re tune ye. Gava te nan û av da kûçik, wê kûçik te nedire û heta bi te re bibe dost jî. Ev teres bi qasî kûçikekî jî nayên, kuro! Teban e, çi ne ev!«
»Keçê eskerkujê, hîn jî heye hîn jî. Te behsa berx, kavir, elok, dîk, mirîşk û hêkên ku em ji çawîşê qereqola Sitilîlê re dibin, ne kir. Wan jî bibêje.«
»Ma ji xwe a ku ew lawê nizam kîjan dolê di me de dike, qe wek a vanên din e! Kula wî di dilê min de şax berdaye. Lêbelê çi fêde. Min sed carî ji vî bênamûsê Temo û birayên Temo re got ku binerin bê hûn derbekê li vî berazî naxînin; lê bi a min ne bû. Ji xwe re li vê ecêbê binerin, min heyşt zik zarok anîn, ji xeynî ên mê, yekî nêr ne şibiya min, kuro! Qîzên min hemû li min hatin, lê qismê lawan mû ji wî qahfûrê serê te bernadane. Di rojên ku ez dizam, xwezîka tu li êş baya. Belkî wî çaxî ew jî li min bi-hatana. Di vanên nêr de bi tenê hewara min Reşo maye. Ev lawik tam li pîrika xwe hatiye...«
Heso gotinên wê bi xwe ne xweş anîn. Xwe bi ser hev de guvaşt. Serê xwe rakir, sênga xwe hilda û danî û lê nerî:
»Tu çi dibêjî yanî? Ma qey ez ne mêrekî temam bûm? Însaf, li ser hidûd gava teqîn çêdibû, min gelek caran dixwest ku ez jî xwe berdim meydana şer. Ma ne te jî ew keft û lepta min didît keçê. Çima îcar tu bêbextiyan li min dikî?«
Heso hîn wilo li ser mêraniya xwe diaxivî, dixwest hinekî Sarê nerm bike, dengê teneka melê hat. Ji cihê xwe rimekê qevizî:
»Ev niha kê nîhaye jina vî melî ku li tenekê dixe! Ma niha wextê sihorê ye! Tobe estexfîrulah me xwe dîsa kufir kir!«
Sarê bi ser de hilbû:

»Hey Xwedê topek li rih xisto, tu çima xeberan ji melê re didî! Te aqilê xwe xwariye, sihora çi! Ji meha remezanê re hîn çar, pênc meh mane...«
Dema ku qaçaxçiyan li hidûd dixist û melê gund pê dihisiya, derdiket nav malan û li tenekê dixist. Teneke işareta xwehaziriyê bû:
»Ey gundîno, qaçaxçiyan li hidûd xistiye; esker sibehê tên gund, xwe ji niha ve ji kuştin û lêdanê re hazir bikin!«
Heso bi vê siqêfê ne baş kiribû. Cihê melê li ba Sarê bilind bû. Qîmeteke mezin didayê. Jê re digot »Birayê min ê axretî.« Heyecanê ew girtibû. Vekirî xuya dikir ku ji tirsa eskeran hinavên wî diricifîn. Ricifa hinavan di destan de dida der. Lê çi fêde Sarê ev aliyê Heso ne didît. Kone

fikirîbû. Ji bo ku kuflet û bi giştî jî Sarê wê ricifê nebîne, herdu destên xwe xistibûn bin lihêfê. Bêhemdî xwe gotineke bêisûl kiribû xem ne dikir, wê çi bûba qey. Wê jî di bêhnikên wiha de gelek caran gotinên çort bi hin dost û hogirên wî re kiribûn.
Sarê bi bêhntengî û bi zirt da ser Heso.
»Mele ji temamê vê birekê bi şereftir û namûstir e. Tu çawa dikarî siqê-fan bi mele re bikî!..«
»Erê keçê gotinek bû û ji devê min derket, dinya xerab ne bû, weh! Ziman bêhestî ye. Mîrato carina ji ser sing dikeve. Tuxtikên te dîsa li binguhê hev ketin, hinekî bêhna xwe fireh bike jina min...«
Heso piştî ku Sarê bi qerf û henekan haş kir, li Temo nerî û di ber xwe de got:
»Keçê fêrisa min, de ka bibêje lê, ma bi rastî wextê sihorê ye?«
»Heso, wileh nizanim bê ez ê çi bibêjim. Bi xwe mîza min nayê. Ka li seeta xwe binere?«

Temo xwe li xeşîmiyê danî, mîna ku hayê wî ji tiştekî tune be.
»Min ji te û diya xwe û meseleya vê seetê tiştek fêm ne kir, yabo?«
»Erê lawê min, seet di nav şeqê diya te de ye. Yanî gava mîza wê dihat me dizanîbû ku bûye wextê sihorê. Em bi mîza wê re radibûn sihorê, ma nayê bîra te lawê kerê?«
Seet yek kêm çarîkek bû.
»Aha wileh qewimî, romiyan li me teqand! Temo xwe neke wek Sarê dernekeve hewşê, binere wê gulenin li binguhê te bikevin. Lawo dîn nebe dernekeve! Keçê Sarê Sarê, keçê were hindur! Howeh tu li vê ecêbê, agirê ku di vê jinikê de ye kuro! Erê keçê esker in û ji xwe re êretî diteqînin we çi ji wan e. Tenûr di vê jinikê de ye tenûr! Ez fêm nakim bê zewqa vê hishisandinê çi ye haho!..«
Di pey lêxistina mele a tenekê de hîn nîv seet derbas ne bûbû, teqîn bi hidûd ket û weke baranê gule bi ser Zorava û gundên derdor de bariyan. Eskeran mîna ku qaçaxçî hemû ji Sirêçkê û Zorava bin, berê tivingên xwe ber bi gund de vekiribûn û bêyefş fîşek diteqandin. Bi teqînê re her tim terempêlên wan xwe ji ser rêya Îpekê berdidan gundan û di pey tibabekî re, li deriyê hin gundiyan dixistin. Bi terempêlên xwe çarhawêr şintaq di-gerandin. Nav mayinan bi şintaqê wek royê ronî dikirin. Lêbelê vê carê ne terempêlên wan dageriyan gundan û ne jî şintaqa wan xuya kir. Ji şewqa fîşekên hewayî pê ve tu şewqê xuya ne dikir.
Qûna Heso erd ne digirt. Mirov digot qey kelefên wî xwe ji ser
24

kulîmekan dane aliyekî; kulîmek bêgoşt tazî mane, kabên kulîmekan di çerm de radibin, çerm diêşe. Diqeliqî, nikarîbû li qûn rûnişta. Bi dizî balîf ber bi pişta xwe de kişand, xwe palda û ling kirin pîj. Destê çepê xist bin serê xwe. Bi destê rastê, mîna ku dilê wî pir sivik lêxe û vê lêxistinê

hinekî ragire sênga xwe dewisand. Lêvên wî ên tije herx ziwa û çilmisî bûn. Ronahiya lempê xwe dabû ser rû, herxên lêvan dibiriqandin. Çav ne dikutkutîn, çûbûn xwarê û beloq dinerî. Guh ji qiyasê der, rep rawestiyabûn. Bêvila şerbikî piçûk û zirav bûbû. Firnikên bêvilê xuya ne dikirin. Ji çenê berjor ve, serê wî qoqekî miriyan di bîra mirov de dianî. Te digot qey li ser hidûd mayin bi wî û hevalê wî de teqiya ye, ew birîndar e û hevalê wî jî hatiye kuştin, wawîk term dixwin û ew jî ji desthilanîn ketiye, nikare tiştekî bike. Di diruvekî wilo xof de bû! Temo û Seydo li wê navê diçûn û dihatin sobe dadidan û bi hev re diaxivîn. Lêbelê wî ew ne didîtin. Dilop ji bin zikê xênî wek ku mirov kevirekî di nav gola avê de wer bike li hindurê teştê diketin; peşk bi ser sêngê de dipengizîn, bi xwe şiyar ne dibû. Nêrgiz ji girî zîz bûbû. Xweha wê a nehsalî Seyrê bi ser Nêrgizê de dikir qelebalix. Meyro jî bi Seyrê re dixeyidî. Lê dîsa jî dengê kesekî ji van ne diçû Heso. Xelîl kîsikê kabên tîlkirî vala kiribû erdê wî û Demo û Şewqedîn bi guhkişînkê dilîstin. Bi vê reqepolkê jî agahdar ne dibû. Sarê ketûber esker dabûn ber xwe. Derdorên gund ji cendekan raxistibû; li bestê xwîn rabûbû, xwînê gewde ber bi qereqolê de digindirand. Bi vî şerê Sarê jî hayî ne dibû!

»Heso Heso, de ka rabe ser xwe kuro, çi bi te hatiye? Xwarin hazir e rabe gepeke nan bixwe.«

Gerek şiyar bûba. Ji ber ku Sarê bi dengekî bilind sê, çar caran gazî wî kiribû. Sarê ji Temo re got:

»Lawê min, ew bavê te mir çi pê hat? Ka binere bê tu wî ji xew ranakî. Çend niqurçkan jê bide...«

Şewqedîn bêî ku bavê wî dapîra wî bibersivîne, ji cihê xwe pengizî û bi lez çû ber serê bapîrê xwe li ser pêyan sekinî. Xwe heta bi newqê tewand, milên bapîrê xwe hejand û hinekî bi deng:

»Kalo kalo!..«

Xwînê xwe dada mejî. Çavan di kortikan de wek du xarên zindoqî lîstin. Mîna pezê bin kêrê, xirînî bi qirikê ket. Reş û sipî bû. Dûv re bi carekê ve lerizî çeng bû û li qûn rûnişt. Eger di vê bêhnikê de Şewqedîn jê bêtir pêhlewan derneketiba û xwe ji ser nedaba alî, miheqeq wê serê wî
li çena Şewqedîn keta û çend diranên lêwik bihatana şikestin.

25

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Hêdî hêdî bi ser hişê xwe ve hat. Xwe pal da. Xwest ku istîxfara xwe bîne û bibêje »Eşhedûenlaîlahe îllellah. Ya reb me bisitirîne!« lê nikarîbû bigota. Ji taqet ketibû.

Sarê:

»Heso, Heso kuro zû xwe bide ser hev! Te êvarê jî ne xwaribû, were bixwe!..«

»Hi te got çi, Sarê?«

»Min got dest û ruyê xwe bişo. Ferecê lê xistiye, berî ku teres bigirin ser me, em xwarinê bixwin. De zû were, zarok hemû li ser sifrê li bendî te ne. Bilezîne, zû were...«

Xwe tev xirciland. Pêşî herdu destên xwe bi hev firkandin, dûv re çavên xwe û dûv re jî rîha xwe firkand. Mîna ku hîç tirs pê re çênebûbû, hay û bayê wî ji tiştekî tune be, xwe veparimand û got:

»Sarê, ez hinekî ji xwe re xilmaş bûbûm. Ji êvara xwedê de xew ne ketibû çavên min. Malxerabnebê, hema te ez şiyar ne kiribama hê. Bi zorê çavên min çûbûn ser hev. Wey hezar carî mala vî xwedayê mezin ava ku hûn pîrek ne kirine tiştek. Eger hûn jî tiştek û miştek bûbana, ma qey bazarî bi we re dibû! Wilehilezîm we ê em zilam bi saxî çandibana, lê!«

»Çorto mortkî nepeyive, dirêj neke zû were!«

Heso ji rastiyê direviya, xilmaş ne bûbû. Di kêlîka ku xwe palda bû ketibû xeyalan. Li xwe kiribû sibeh. Esker anîbûn gund. Reşo şibandibû lawê Farisê qesirî Mirad û bi dû cemsê ve girêdabû; cemse li dor gund digerand. Reşo dikire hewar. Sarê bûbû Rewşêya diya Mirad. Esker wê Reşo bi dû terempêlê vekin, Reşo bi haweyekî barbar bikujin û Sarê jî wê deng ne kiriba ha! Ev dikete serê kê? Dilê Sarê wê çawa bikarîba li himber vê wehşetê debar kiribaya! Reşo bi dîn û îmana xwe ne dida. Di dinyaya xwe de ew bi qasî pêxemberekî mezin kiribû. Dinya li aliyekî mêzênê, Reşo li aliyekî mêzênê danîbû û bi dinyayê re diwezinand. Jê re digot »Sitûna mala min. Tu hêviya min î. Mekteba teyaran bixwîne, bibe şifêr. Teyarê tije top, metilyoz, fîşek, bombe û deremêt bike û were van qereqolên romiyan hemiyan xirîxopan bike!..« Îcar Sarê wê çawa bikarîba xwe li ber qîr û hewarên Reşo bigirta û mala xwe û eskeran li topekê nexistiba! Ji xwe dê Sarê rahişta çekê herî mezin û êrîşî ser komutanê qereqola hidûd Mehmet Bîçer bikira. Çifta dulûle di zikê Bîçer de biteqanda û hinavên wî berdana erdê.
Heso li xwe danetanî ku tirsa xwe bide der. Gava qîq mabû, çav çûbûn xwar, çavan ne dikutkutand û wilo beloq li binê beştan dinerî, Sarê di nav
26

lepên eskeran de bû. Eskeran mîna ku di Rewşê de kiribûn, li Sarê li himber dost û dijminên wî û temamê gundiyan êşkence dikirin. Heso behetî bû! Esker bi qezetoran kişiyabûn ser Sarê, canê wê diterişandin. Bi niqe niqa dilopan şiyar ne dibû. Dema ku Rewşê komutanê qereqolê kuştibû û eskeran jî serê Rewşê di bin lingên panzêrê de kiribûn nanik, wek niha zivistan bû. Ji erd û ezmên av diherikî û mejiyê wê li ber xwe biribû. Wî, di mejiyê Rewşê de, mejiyê Sarê didît.
Serşok di qorziya odê de ye. Qorzî li başûr dinere. Serşok û şibake nêzîk

hev in. Serşok bi qasî bihustekê ji erdê bilind e. Şibake li erdê dinerin. Di vê odê de ji xwe bi tenê du şibake hene. Herdu jî incex bi qasî devê tenûreke berîvanî mezin tên. Ji der ve de gava mirov di şibaka nêzîkî qorziyê re li hindur dinere, serşok bi telekî xuya dike. Raserî serşokê tam di jora dîwêr de bi qasî gokekê mezin û girover kulekek heye. Ev kulek jî bi şev her tim perdekirî ye. Bi roj maliyên Heso xwe li ber ronahiya vê kulekê dişon.

Heso bêdilî xwe ji nav livînan rabû, ber bi serşokê de meşiya û çavên xwe li qabqabkan gerandin. Qabqabk seraqet li ber serşokê ne û serşok jî di binya livînên wî re ye. Ji ser livînan qabqabk xuya dikin. Îcar ji xwe hîç pêwîst nake ku li wan bigere. Xwe daqûl kir. Rahişt herdu qabqabkan. Bi haweyê ku wê qabqabkan bixwe, li qabqabkan nerî. Qederekî li hev qulipandin û dûv re dîsa danîn erdê. Ji kûraya kezebê keserek kişand, lingên xwe hepişand qabqabkan û bi teqil rabû. Lêbelê xwezîka ranebûya, bi ketineke pir pîs li erdê veziliya! Bi rastî ji aliyekî de jî ev ketin heq kiribû. Ji ber ku him qederekî li qabqabkan temaşe kiribû û him jî di dûv re wê berevajî têxistana lingên xwe. Qabqabkan ling dizewirandin, lê dîsa jî bi xwe hayî ne dibû ku ev zewirandin ji ku tê. Qayişa fera rastê ji avê riziya bû. Û wî bi xwe jî dizanîbû. Digel vî haweyî îcar ji dêvla ku pêşî lingê xwe ê rastê bilind bike, lingê çepê bilind dike. Ji xwe wê qeweta kelêx hemû têkeve ser lingê rastê; lastîka rizyayî ji ser hev here, lingê ku ji êvar de ne hedinî ye bixile û wek bertelaşekî ji hewa de bê xwar.

Sarê mîna çûkekî ji cihê xwe firiya, »Pepûko Temo bavê te mir!« got û xwe avêt ser Heso.

»Keçê xwe ji ser min bide alî te ez fetisandim! Qey çavê te lê ye ku tu min bi dostayî bikujî, weh!..«

Lingê wî tehenî bû. Lêbelê wî digot »gwîzek derizî ye« Piştî ku Temo bi bazinê ling lîst û ling bi vir û wir de baş xirciland, bawerî pê anî ku ling

fikiyaye.

27

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Yabo destûrê bide min ku ez herim Sirêçkê gazî Seroxan bikim. Lingê te fikiyaye...«

»Eman tu tiştekî wilo nekî! Dibe ku eskeran kemîn avêtibin dora gund, wê te bikujin. Em ê di rûnê xwe de biqiçqiçin ka bê Xwedê wê çawa bike heta sibehê...«

Di warê cebarê de doktoriya Heso hebû. Heta ji nexweşiyên heywên jî fêm dikir. Lingên gelek heywanan cebirandibû. Herwiha ling û destên insên jî. Li herêmê bi qasî Seroxan navdar bû. Îcar digel vî haweyî dîsa jî nizanîbû ku lingê wî teheniye.

»Hinek mû, hingiv, rûnê malê û çengek kizirk ji min re bînin.«

»Yabo ji dêvla rûn û kizirkan ve ez mîhekê bigurînim, ne çêtir e gelo?«

»Êh bê çi bi aqil e, wê ji min re pez bigurîne û lingê min têxe eyêr, lawê diya xwe!«

»Baş e, ji gurandina dîkê qoqo an keroşka şîne re, tu çi dibêjî?«

»Dirêj neke. Ji min re zû lepek mû, nanikek hingiv û du, sê kevçî rûnê malê bînin!«

Heso mirovekî çikûs bû, pir li ber mêl dida. Eger ne ji berberiyê ba, belkî di herêmê de bûba dewlemendê herî mezin jî.

»Temo, kuro ma te hîn jî bavê xwe nas ne kiriye bê çi mal e? Ew dikare temamê malê me li devê romiyan biqelibîne, lê dil nade ku pênc wereqeyan têxe bêrîka Reşo. Lingê wî şikestiye, qêbil nake ku em keroşkekê ser jê bikin û çermê wê bigrin ser lingê wî. Dev jê berde, bi cehnema wî kirî. Keçê Meyro Meyro, wan quzelqurtan jê re bîne, çawa dixwaze bila wilo bike, wey bimir!«

Xwarina wan, şîva ku hîn ji êvar de mabû. Xawarin hûr û roviyên heşandî û tirşika mişmişan bû. Di vê malê de li ser daxwaziya Heso her ji panzdeh, bîst rojan miheqeq wê carekê beroşek hûr û roviyên heşandî bi-
hatana kelandin. Di eslê xwe de Heso ne ku bi rastî hej hûr û roviyên heşandî dikir, diruvê Circîs bi hûr û roviyan dixist ji ber hindê tahm ji vê xwarinê distend. Gelek caran, bêî ku malî pê agahdar bibin, wî bi dizî çend kubikên dagirtî birine besta gund, di nav pîsiyê de dane û dûv re jî şewitandine. Di kultura wî de hûr û roviyên dagirtî bi destan dihat xwarin. Lêbelê wî bi kêrê kubik û rovî pêşî diterişandin, dûv re jî dikir qitîtk û bi kevçî dixwar. Di kubikan de serê Circîs û di roviyan de qama Circîs didît.
Sarê:
»Hema bêdilî xwe ma be dîsa jî çend gepan bixwe. Sibehê wê romî bi-
28

girin ser gund. Bi zikê xwirînî tu ê nikaribî xwe li ber dar û sîlên wan bi-girî. Wilo nabe heyran, lîçekê bixwe...«
»Keçê ez ne ketime taya lêdanê. Ma qey hindik carî min lêdan ji dest wan xwariye. Bi qasî tayên porê te şiqam û dar li min ketine. Ez ketime wê heyirê ku sibehê ez ê çawa li ser vî lingê fikyayî bikaribim bimeşim; bêî
ku ew kafirê birayê te min kulek bibîne ez ê çawa bikaribim xwe li ser lin-gan bigirim! Ji danê esirê heta ku ro çûye ava ez li ser xênî bûm û min qelş dadigirtin. Min sê zembîl ax kişand ser xênî. Birayê te Circîs jî ji ser xaniyê xwe li min temaşe dikir. Xelkê vî gundî bi carekê ve heta ku ro ketiye tasê, li min temaşe kiriye. Îcar gava sibehê ez bi vî halî derkevim nav wan, wê ji min re çi û çi nebêjin! ‘Heso ji tirsa ku lêdanê nexwe, xwe

dikulkulîne.’ Ev gotin ji bo min mirine, mirin! Xwezîka îşev vî Xwedayê mezin emanetê xwe ji min bistenda, ez bimirama û ev ecêb bi serê min de
ne hatibaya!..«
Pişta xwe dabû çar balîfan û pîjaq dirêj kiribûn. Paçikê hevîr danîbû ser newqa xwe. Ji pêçik bêhneke tirş difûriya. Paçik ji pînan pev hatibû dirûtin, kevnekotî bû. Lêbelê wî ew bêhn ne dikir. Legana sifir xistibû nav şeqên xwe. Legan hawêrdor kubyayî bû. Li himber ronahiya lempê hindurê leganê qer û teniştan jî argonî dibiriqand. Di leganê de sê hûr, du roviyên zirav û nîv metro û bi qasî bihustekê roviyekî qalind, hebû. Xwarin şilekî danîbûn ber. Wî wilo xwestibû. Kevçiyekî darînî û kêreke kalanhesinî êretî di nav hûr û roviyan de bû. Doxika kevçî bi kelpik û derizî bû. Kevçî ne rengînî bû. Hûrê herî girover xistibû kefa destê xwe ê çepê, kêra kalanî bi destê xwe ê din zeft kiribû, li Sarê temaşe dikir û di dilê xwe de digot:
»Ez zilam û Sarê jî pîrek e. Ez ditirsim û ew natirse. Gelo ew vê tirsa min dibîne? Ez xwe li himberî wê piçûk dixînim. Di dînê me de cihê pîrekê tune ye; lêbelê ê min heye. Pîrek nikare bibe mîr û hakim, lê ez dikarim bibim hertişt. Heta şahidiya du pîrekan bi qasî a zilamekî ye. Mesele gava yek yekî bikuje û pîrekek li ser ê qatil bibe şahid, wê şahidiya wê qebûl nebe. Divê ku du pîrek bi hev re vê şahidiyê bikin. Lêbelê şahid eger zilamek be û ev zilam çendî pêxwas be, dîsa jî xem nake. ‘Pîrek ji bo şehweta zilêm hatiye dinyayê.’ Ew insanekî ku mirov bazdide ser yanî. Ma ez her şev baznadim ser Sarê, hi! Îcar çima ez ji eskeran ditirsim û ew natirse?
Di dînê me de wezîfa pîrekê ew e ku zilêm berde ser xwe, zarokan çêke û ji gotina mêrê xwe dernekeve. Ê hema bi telaq ev ne tu ûjdan e! Sarê ji min û bavê min çêtir û mêrtir e ma qey bi tirtirê ye! Na na, pîrek mê û zil-

am jî nêr e ehmeq. Cihê ê nêr her tim li jor e. Xwedê ji nêran hez dike. Xwedê pêşî nêr û dûv re jî, mê ji nêr çêkiriye. Îcar mêr çi tiştê ku herî kilêt be tê bike jî, heqê wî ye. Her roj dev û diranên wê bişikîne, dîsa jî heqê wî
ye. Pîrek bi wî, ne ew bi pîrekê heye. Zilam çawa bixwaze, pîrek mecbûrî kirinêye. Kuro ma ne mele û şêxên me dibêjin, 'Gava li zilêm rabe, zilam bixwaze û di vê navê re destê pîrekê jî di nav hevîr de be, pîrek bêdiliya wî
bike û xwe bi dest ve bernede, gunehkar dibe!' Ji bo wî pîrek erdekî beyar e, çawa kirêb bike malê wî ye, weh! Ma ne şêxên me dibêjin, 'Aqilê heft pîrekean di serê mirîşkekê de ye. Û mirîşk jî nikilê xwe li gû dide; tevdide û dixwe.' Howeh li vê ecêbê, îcar mirîşka mala min, ji tu tiştî natirse! Û ez ev zir dîkê ha, ji tirsa eskeran dikim bifetisim kuro! Ê lawo hema bi telaq, Xwedê û Mihemed herdu jî li van pîrekan neheq in! Tobe es-texfîrulah min xwe dîsa gunehkar kir!.. «
Sarê, bi ser vê pîrekiya xwe de îcar ji bavikê Hûran bû û hûrî û bavikê Heso jî ji bav û kalan de dijminên hev bûn. Mîna ku ev hemû ne bes bin, tew bi ser halan de pîrê xweha Circîs bû û Circîs jî serekê temamê mal-batê bû! Sarê tu rê ji Heso re ne hiştibû ku Heso wek camêran bikarîba, li ser qisûr û kêmaniyên xwe hinekî biaxiviya. Di nav qerfan re ev aliyê xwe li hev dixurbiland û dida der.
Sarê got:
»Heso tu çi li min dinerî? Ma qey di dawiya vî emirî de tu dilketiyî min?« û derket hewşê.
Heso serê xwe bi ser leganê de xwar kir. Piştî ku tibabê deqîqeyekê li hûr

nerî, mîna ku hûr serê Circîs be, bêî ku ji tê bike pelixand û dûv re jî bi kêrê kişiya ser. Zîqîniya kêra wî diranê mirov diqiriçand. Ne dixwest bixwe, nikarîbû bixwara. Bi xwarinê re pevdiçinî. Tam bi haweyekî ere-bî, bêmirês dikir û dixwar. Gava radihişt kevçî ber bi devê xwe de bilind dikir û bi hêrs dîsa diavêt nav xwarinê, ji doxika kevçî, mereq bi zend de dihate xwar, li enîşkê radiwestiya û bi ser xwarinê de dinisilî. Rîha wî ji libên dên, mîna erdê bizarkirî bûbû. Çep û rast xwe dixwirand. Geh destê xwe diavêt nav şeqên xwe mû dikişand geh ji bin çengan pirç radikir geh tiliyên xwe dixistin qulên bêvila xwe, kerik derdixist û di nav xwarinê de werdikir. Bi doxika kevçî xwarin tevdida. Nizanîbû bê çi dike. Rûn li serî vedabû. Gava serê xwe hildida û datanî, şewqa lempê di tilmika serî de diciviya, tilmikê mîna kevirê hestan çirûsk vedida.
Piştî ku eskeran qederê bîst deqîqeyekî weke tu xwê têxî êgir fîşek
30

teqandin, nîv seetekê bedeng man. Dûv re dîsa bêwestan bêhnikekê hawêrdor gule barandin...
***
Ewr dapiçiyane, ro derketiye. Xumîn û olan bi newalê ketiye. Ji newalê seranser mij û dûman bi ser silûmên çiyan de bilind dibe; çiya xuya nakin. Ji barana şevê din çem rabûye ser xwe; bi hêl û mêl diherike, dar û
ber dane ber xwe û bi nav erdê binxetê de diavêje. Di hewdên qelaçên Zorava û çiyayên omeriyan de av meya ye, çal hatine dagirtin. Ji rizdên zinaran av bi ser lat û tahtan de dadiwerive. Sarinca kevnare ku li nêzîkî gund di tahtê de hatibû kolan, ji avê mişt bûye. Erdên avgîr bûne gol. Balinde bilind difirin. Etlayî nakeve refên zerzûlan; ji roava ber bi rohilat de di ser gund re refek derbas dibe û yek tê. Têtî, koleke û gabelekan xwe

ji qelêç berdane ser bênderên gund diçêrin. Mîna ku bêhneke din wê şa-pateke wek a şevê din rabe, bi lez nikilên xwe li erdê dixînin; bi haweyê ku kumika xwe şeh bikin lapûşkan diavêjin serê xwe; kumikê xwe daye ser hev û mîna çengelekî tewiyaye. Li ser bênderên jora gund, bi dû hev dikevin, xwe vedipejinînin. Reşêlekê xwe li wê navê danî û disûrike. Çend têtî ketine gevzekê, baskên xwe li hev didin û li derdora xwe çeng dibin. Zelorek ji dera ha kulkulî tê. Beraşekî xwe li ber xist, ew sekinî. Du reşêle firiyan û ên din bi carekê ve xwe melisandin. Li hewa başokeyek dilîze. Ji hewş û axuran barîna pez û orandina dewêr bi kîlometroyan deng vedide. Ker dizirin, şîhe şîha bergîlan ji bin sefikan tê. Lêbelê kûçik bêdeng in. Insan bêdeng in. Zarokan xwe dane pişt kewaran, ketine hin-durê rislên genim û kulînan; di nav livînan de xwe kirine gilok û îske îs-ka wan e digirîn. Hin ji wan bazdidin kadînan, xwe di nav kayê de vedişêrin. Qaşo dayik jî berdilê zarokên xwe digirin, bûne xemrevîn, lê ew ji zarokan bêtir digirîn. Bav dixwazin zarokan bi kab, xar û şekirê çayê bikenînin; zarok şa nabin. Ji bavan re dibêjin, »Ma hîn esker ne çûne yabo?« Paxafê girtiye hinavan kutkuta dilê wan e! Li ber çavên zarokan hertişt belê hertişt bûye esker; li hertiştî bi xof temaşe dikin! Qîran didin! Di himbêza dê û bavên xwe de mîna pelên daran dilerizîn. Bav bêçare, dê bêçare »Em çi bikin ax Xwedo!« Qîr û hewarên zarokan kezeba wan dax dike; xwîn li dayik û bavan vemiriye!

Eskeran bi sariya sibehê re, jora Zorava û derdorên gundên cîran zeft kiribûn. Bi ronahiya rojê re xwe pênc pênc ji qelêç berdan gund. Li dor gund belav bûn û ristik girtin. Digel usteymen Mehmet Bîçer sih û neh

esker hatibûn gund. Hejmara vê carê li gor hejmarên berê ku digirtin ser

gund, hinekî kêm bû. Her gava digirtin ser gund kêmî pêncî, şêst eskerî ne dihatin. Komutan Mehmet Bîçer bi qama xwe ji eskeran pir ferq dikir. Mirovekî qamqut û dagirtî bû. Qesabê qereqolê Cimo digot, »Qama vî usteymenê dêqahb, metrok û pêncî û du santîm e.« Bîçer kej bû. Mîna zarok û xortên herêmê porê xwe kurt jê dikir û temberî berdida. Bi giştî serqot digeriya. Li gundan ji xwe hîç ranedihişt şifqê. Bîçer ji bajarê Enqerê bû. Li Nisêbînê rûdinişt. Ew û jina xwe ji hev cihê bûbûn. Jina wî li dibistana »Merkez ilkokulu« mamosteyî dikir. Keçek û lawek wan hebûn. Ew bîst û neh salî û jina wî jî bîst û pênc salî bû. Wî ji jinikê hez dikir, lê jinikê jê hez ne dikir. Têkiliyên jinikê ji karmend û mamosteyên hevalên xwe bêtir, bi dikandaran re hebûn.
Mehmet Bîçer li pêpîkê xist. Bi dengê pêpîkê re, ji bilî deh eskerên ku li jora gund li ser pêyan rawestiyabûn, esker hemû li ser bênderên jêra gund civiyan. Muxtar û bekçiyê gund Bedran û Remo jî di temenê de çik li ber deriyê hewşa Circîs rawestiyabûn. Navbera hewşê û eskeran mişarek bû. Bîçer bi dengekî pêt:
»Muxtarê qewad û bekçiyê qûnde, ji dêvla ku hûn wilo wek sitir li wir rawestiyane, werin xêrhatinê di me de bidin!«
Li gor şertên ku qereqolê ji gundiyan re danîbûn, gava esker bihatana gund eger muxtar li malê ba muxtar, eger muxtar ne li malê ba bekçî diva bû pêrgî wan derketa. Îcar gava ne muxtar û ne jî bekçî li gund bana, wê melê gund ya azeyekî ya jî rîhsipiyekî ev kar bikira. Nemaze ne başçawîşê qereqola Sitilîlê û ne jî komutanên qereqolên hidûd, li gor şertên ku danîbûn, meşiyane. Pêrgîn û nepêrgînî herdu jî sûc bûn. Dema ku keye, kizîr, pasban û hwd. pêrgî wan diçûn, digotin »Xiyar çi karê te li vir heye? Ma qey em rêya mala te nas nakin? Kerxanecî biceheme!« Îcar
gava kesek pêrgî wan ne çûba, »Qahpino ma ne me hin qanûn ji we re

danîbûn! Hûn me piçûk dibînin ha!..« digotin û lêdan li wan dikirin. Muxtar û bekçî bi bazdan çûn ba komutên, ketin temenê û gotin:
»Emir bike qomandarê min!«
Komutan hema wilo yekser piştî ku pêhlewankî, çep û rast çend kulm ketûber bi wan ve kirin, got:
»Pêşî, kûçikan hemiyan ji gund dûr bixin û dûv re dîsa werin vir, temam qewadino!« û digel eskerên xwe li wê navê piyase kir.
Bîçer ji kûçikan pir tirs û sawêr digirt. Li herêmê gelek kûçik kuştibûn. Lêbelê digel ku ewqasî ji kûçikan bi tirs bû, tu emirê ku gundî kûçikan bi
32

xwedî nekin ne dida. Gotina wî qanûn bû. Û temamê xelkê herêmê jî bêlam û cîm situyê xwe ji van qanûnan re xwar dikirin. Digel vî haweyî dîsa jî wî jiyan li kûçikan serbest kiribû. Bedran û Remo ji bo ku kûçikan bidin hev û wan derxînin derveyî gund, bi nav malan ketin. Gundiyan mercên ku komutanên hidûd û başçawîşê Sitilîlê danîbûn, yek bi yek ezber kiribûn. Ji şertên komutanên hidûd yek jê, gava bigirtana ser gund, bêgotin divabû herkesî kûçikê xwe bi çolê de biterqanda. Gundiyan li ser terqandina kûçikan gelek caran bi tevayî lêdan xwaribûn. Kûçik bi çolê de ne diterqiyan. Hûto ji vê re rêyekê dibîne. Dema ku eskeran digirt ser gund, herkesî kûçikê xwe şibaq dikir û dibirin nav rezê ku li jora gund di-ma; kûçik bi darên behîvan ve girêdidan.
Li gundên ser keviya mayinan, jiyan bi hemû haweyê xwe merez bû. Di her guhertina komutanekî hidûd de her tim hin qedexe dihatin danîn. Gundiyan ji van qedexan re digotin »Qanûnên romê.« Komutanan di gundan de pêşî xwedîkirina hespan qedexe kirin. Dûv re bi şev ronahiya luks û lempê, dûv re çûn û hatina bajêr a bi şevê qedexe kirin. Qedexe ji qedexê veket heta ku giha şevbihêrka gund û lîstika hingulîskê.

Gundiyan mîna demên rabihurî ewqasî êdî nema cesaret dikirin ku bi şev ji mala xwe derkevin û li maleke xuyayî şevbihêrkê bikin.
Bêî ku Bedran û Remo ji bo biderkirina kûçikan bangî gundiyan bikin, ji xwe ji zû de herkesî kûçikê xwe şibaq kiribû û li gasînê li bendî emirê Bedran rawestiyabûn. Di demên pêşî de, li gasînê kûçikan bêcirî dikirin û pevdiçinîn. Lêbelê di dûv re ew jî hêdî hêdî hîn bûn; ne digel hev bêcîrî û ne jî êdî pêvçûn kirin. Kûçik gihabûn deraxeke wilo têgihiştî, eger ji benda pizûran berpirsiyarê kûçikan Hûto û ji benda hûran jî berpirsiyar Cemşît, ji kûçikan re bigota »Kûçikino esker hatine gund; herin nav rez û heta ku esker li gund bin ji nav rez neyên«, wê kûçikan jî eynî wilo kiribana. Çimkî kûçikê Qasoyê pizûrî Doguj di her gava ku esker dihatin gund, bêî ku hin wî şibaq bikin wî bi xwe bazdida nav rez û hildikişiya ser bena rez li gund temaşe dikir. Dema ku esker ji gund bi rê diketin, wî dikir ewte ewt, rast berê xwe dida gund û dihat mala xwediyê xwe. Pizûrî ji aliyê kûçikan de hinekî dewlemend bûn. Bîst û heft kûçikên wan hebûn. Hûran jî nozdeh kûçikên xwe hebûn.
Berpirsiyarê kûçikan Cemşît, berî Hûto bi rê ket. Doguj bi sîne bû. Ji bilî wî kûçikên din hemû şibaq kirîbûn. Doguj mîna ku wê esker wî û hevalên wî gulebaran bikin, ketibû pêşiya karwên, nûze nûz jê dihat û bi lez diçû.

33

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Hûto kûçikên xwe li jêra rez û Cemşît jî ên xwe li jora rez bi darên be-hîvan ve girêdan. Şerîta ku Doguj pê hatibû girêdan li dor deh metroyan dirêj bû. Hûto bi armanca ku Doguj nahtoriyê li hevalên xwe bike, her tim şerîta wî dirêj berdida. Çimkî bi rastî gava kûçikan pevdiçinîn, Doguj jî êrîşî nav wan dikir, hemiyan ji tirsa bi xwe de dimîzt û bêdeng

disekinîn.
»Me meseleya kûçikan hal kir qomandar. Êdî bi hêsanî hûn dikarin gund saxtî bikin.«
Bîçer li himber wan bi haweyê ku ji dinyayê re meydanê bixwîne, çû û hat û darek li kêleka Remo a çepê xist.
»Xiyar, ji min re komutanê min bibêje temam!«
Barînî pê ket:
»Temamdir qomandar!«
Bîçer li dor xwe zîzikî, xwe tibabê gazekê bilind kir û cotikî pehîn li defê sênga wî xist. Remo wek celba heriyê bi erdê ve zeliqî.
»Lawê qahpikê, komutanê min, komutanê min bibêje temam, hi hi hi!«
»Wilehî temam qomandar, ez ê bibêjim...«
Bîçer dev jê berneda. Pê li zikê wî kir û xwe bi ser de daqûl kir:
»Pêzeveng, pêzeveng, komutanê min komutanê min!..«
Remo tam ji derb ket:
»Pêzeveng qomandar û qomandar û pêzeveng...«
Bi tirkî dizanîbû. Lê ji tirsa lêdanê devê wî ketibû hev, bîr ne dibir bê çi digot.
Bîçer ji sih û sê eskeran çar qefil çêkirin û dest bi saxtîkirina gund kir. Qefila wî ji deh eskeran pêk dihat. Pêşî ji mala Celîlê hûrî dest pê kirin. Xaniyê Celîl tam di pêşiya gund de bû. Bi sipehîbûna xwe li temamê xaniyan ferq dikir. Qesirbendê omerî Kopo qesir li ser du tebaqan ava kiribû. Kevirên qesirê hemû sipî, şehkirî û bi hosteyiyek delal li ser hev hatibûn nijinandin. Ji dûr ve qesir diket nav ruyê çiyê, mîna pelekê berfê diyar dikir.
»Komutanê min me zeft kir!«
Eskeran bergîl şibandibûn hespê. Bi rastî bergîl ji bergîlê bêtir dişibiya

kerên Bismilê û hinekî jî hespên kirgizî. Bergîl him reş û qemer û him jî li gor bergîlên adetî pir hûr bû. Kenêr ji bo vê bergîlê digot, »Bêdevjeng dikarim bibêjim, eger ez vê bergîlê bibim mazata Diyarbekirê û wê tes-
lîmî kose û berkosên diyarbekirî bikim, wê bi hêsanî bikaribin bergîlê
34

bifroşin bismiliyan.«
Bîçer li bergîlê ecêbmayî mabû! »Ev çi tişt e, ev çawa heywan e!« digot û li dor bergîlê bale bale diçû û dihat. Piştî ku tiştek ji bergîlê fêm ne kir: »Temam! Qaçaxçiyên şevê din ev heywan ji Sûriyê anîne. Gelo kî dizane bê vê heywanê wê bi çiqas pere bifroşin, of aman dayê!« got û kul-
mek bi argûşka Celîl ve zeliqand.
»Begim haşa, lê wilehî tu şaş î yaho. Çar sal e ku ez vê heywanê bi xwedî dikim. Ji başqomandarê Sitilîlê bipirse. Qomandarê min...«
Ne hişt ku gotina xwe biqedîne, kulmeke din avêt dev û bi zirt: »Başkomutan nebêje kewaşe! Başçawîş çawa dikarin bibin başkomutan allhumme ya rebî!..«
»Pardon yaho pardon, bibexişîne qomandarê min. Erê başçawîş qo-
mandarê Sitilîlê tam neh caran li vê bergîlê siwar hatiye. Ez bi xwe digel bergîlê gelek caran çûme nig başçawîş qomandarê mentîqê. Ji kerema xwe re jê bipirsin begê min...«
Ew hîn wilo diaxivîn, ji taxa jor dengê teqîna G3ekê hat. Hema wilo pê re ji nav gund û çarkenarên gund, teqîn bi ezmên ket û bû qîr û qiyamet! Bîçer, Celîl bi ser bergîlê de dahfand û li Bedran û Remo demaçe kişand. Eskeran jî bi dengê herî bilind:
»Kesek xwe tev nexircilîne!« gotin û G3ên xwe çep û rast li dor xwe gerandin. Di vê rewşê de hemû bêkip çar deqîqeyan bêtir rawestiyan.

Piştî ku teqîn ji bayê xwe ket û yeklibkî bû, Bîçer got:
»Esker li pêpîkê xîne!«
Xwediyê pêpîkê ew bi xwe bû, wî pêpîk bi kar dianî. Pêpîk bi qasî kabê beranekî mezin pê ve daliqyayî bû, lê wî pêpîk ne didît.
Esker piştî ku got »Komutanê min pêpîk li ba te ye«, wî jî rahişt pêpîkê û dirêjî destê eskerê di nêzîkî xwe de kir.
»Lêxîne!«
Bi dengê pêpîkê re ji bilî eskerên ku li dor gund nahtorî dikirin, hemû bi bazdan hatin û li ber deriyê hewşa Celîl ketin temenê.
Bîçer bi qahr:
»Ew çi teqîn bû?«
Ji nav rêzê eskerekî dirêj
î rûgirover û esmer, sê pêyan ber bi wî de qedimî, patev da:
»Komutanê min, marekî xwe êrîşî ser min kir; min jî fîşekek berdayê û min ew kuşt.«
»Çi çi? De ka dîsa bibêje bê te got çi?«
35
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Destê xwe ê rastê ber bi taxa pizûran de dirêj kir:
»Aha li wê taxa ha, di axurekî de ji nişkê ve marekî mezin êrîşî ser min kir. Mefera min nema û min jî fîşekek li ser danî.«
Ne wek ku wî digot. Mêr êrîşî ser ne kiribû. Xwe li ser kayê kiribû kilo-fîr û serê xwe di nav kilofîrê de veşartibû. Gava ku mêr dibîne, bêh-nçikyayî bazdide devê deriyê kadînê û ji devê derî li ser kayê direşîne. Mar
ne kuştibû. Zînê bi ser hiltê ku nema biteqîne. Marê ku Zînê kuştibû, hîn li ser kayê bêlept di halê xwe de bû.

Ji bilî qefila Bîçer hin eskeran cercûrek bi temamî û hinekan jî li dor nîv cercûrî, fîşek teqandibûn. Vê teqînê ji herkesî bêtir tesîra xwe li ser zarokan û sewêl kiribû. Lawê Temo Xelîlê şeşsalî ji tirsa bi xwe de mîztibû û hebitî bû. Meyroyê lawik xistibû himbêza xwe, digiriya û nifir dikirin. Sarê hingî ku dev destên xwe kiribû, xwîn ji pişta herdu destên wê di-herikî. Hûçikên kirês û pêşmalka xwe bi carekê ve çirandibûn. Destên xwe bi hinc li hêtên oda kilskirî dixist, hêtan ji xwîna wê sor vedabû.
»Bi navê xort û zilaman bila kesek di hindur de nemîne, herkes teqeze bê vê derê! Lîsta navan bi min re ye. Eger hema yekî kêm bibînim, ji xwe pêwîst nake ez bibêjim, ez ê pêşî di diya xwe û dûv re jî di dê û jinên we hemiyan biku...im! Temam!»
Bîçer piştî ku careke din Bedran û Remo bi nav malan de rê kirin, di-gel eskeran ve xwe berda ser bênderên jêra gund û esker li hev kom kirin. Şeş esker ji komê tibabê sed metroyekî ber bi jêr de dûr çûn û rawestiyan. Ev eskerên din jî yek kete pey yekî, bûn rêz û rast çûn G3ên xwe teslîmî wan kirin. Di şûna G3an de rahiştin darên berû. Darên ku ji terefî gundiyan hatibûn çêkirin, kelemî bûn. Bêhna goştê insên ji daran dihat. Xwînê li wan vedabû debixî bûn. Di lêdanê de tu carî ne dişikestin. Gundiyan ji lêdana niha re, xwe hîn ji nîvê şevê de amade kiribûn. Wan dizanîbû bê sibehê wê esker çi afatiyê bi serê wan de bînin! Mîna Heso xwarin di qirika gelekan re ne çû bû xwar. Bi teqînê re herkes ketibû hev, nema dizanîbûn bê ê çi bikirana. Tew li ba hinan, heyvanê mêraniyê ne-ma bû; bi carekê ve ji desthilanîn ketibûn. Ji derveyî zarokan kesek raneketibû. Lempên xwe vemirandibûn û li reşê heta sibehê sihurîbûn. Bedran û Remo ji benda hûran bûn. Di rojên ku eskeran digirtin ser gund, bêî ku ji benda hûran hin kes bangî hin kesên ji benda pizûran bikin, pizûrî ji ber xwe ve dihatin nig eskeran. Li gor kevnepoşiyan gava yekî hûrî gazî yekî pizûrî kiriba, ev yeka ha kêmanî dianî ser malbata

pizûran. Lewra malbat jî ji hêla hûran ve wê tirsonek bihata qebûlkirin.
36

Herdu malbatan jî xwe ganêre didîtin.
Lingê Heso ji ketina şevê din hinekî diariya. Ling werimîbû. Gava qeweta xwe berdida ser ling, tevzînok bi lêş ve hildikişiyan, janê xwe dida kezebê, çîm direhelî. Lêbelê jana ling û êşkenceya ku wê ji destê eskeran bidîta ji bîr kiribû; ketibû taya ku bi lingê tehenî wê çawa bikarîba derketa pêşberî dijminên xwe. Circîs ew ber bi êvarkî de bijûn dîtibû. Bi zembîlan ax kişandibû ser xênî, li hewşê qutik hûr kiribûn, digel şivên pez rast kiribû, du caran çûbû ser birkê, xwe ji malê vedizîbû, kubikên dagirtî li bestê di nav pîsiyê dabûn û şewitandibûn.
Sarê:
»Hevalbendên te hemû li gasînê li bendî te sekinîne, zû xwe bide ser hev...«
Heso di vê kêlîka ku wê xwe berda ba eskeran, pir dixwest ku Sarê digel wî li ser mêraniyê biaxiviya; navtêdan tê de bêfiranda û çêlî fêrisiya xwe jê re kiriba. »Nîvê hezarî pênc sed e Heso netirse! Av ha li kabê ha li newqê, bide nav, nericife!..« Lê mixabin te digot qey bi geragup lîstiye, kelbetên devê wê venedikir. Sara ku ji eskeran xwîn vedirişiya di vê kêlîkê de nola bûmeke bêdeng li ber menqela êgir xwûz veteqilî bû. Diponijî. Destekî xwe danîbû ser çembilê menqelê û bi destê xwe ê din rahiştibû maşikê, xwelî vedipexirand. Maşik, mîna melhêbê di nav ariyê de dibir û dianî û hildida. Xweliyê girtibû ser rû, rû mermerî vedabû; ji eniyê gilorîkên xwêhdanê hêdî xwe berdidan herxan, ji herxan pir herxên veşartî ayan bûbûn. Di ruyê wê de mirov hemû rê, xaçerê û çivên jiyanê didît.
Heso bi dengekî melûl:

»Sarê, ma tiştekî ku tu ji min re bibêjî heye?«
»Pepûk ew çi kirasê ku te li xwe kiriye! Ew çi çakêtê ku bi ser kirês de ye! Te porê min kurkiro ma qey tu ê biçî dawetê! Te aqilê xwe xwariye, ev çi ye!..«
Heso hinekî serxweçûyî bûbû. Di rojên ku eskeran bigirta ser gund divabû şerwal li xwe kiribûya. Her tim jî wilo dikir. Çimkî di êşkencê de kirês wê sitara xwe lê ne kiriba. Felaqe hebû. Di felaqê de qûn belbelot dibû. Daliqandina serserkî hebû. Eskeran termikî ew bi dû xwe de dik-işkişandin. Li wan siwar dibûn û ew li dor gund digerandin. Bi dû panzêr û cemsên xwe ve jî girêdidan.
»Keçê Sarê bi şêxê erdê li Bexdayê, tu jineke pir delal î! Te bêhna min derxist, lê. Bi telaq min hîç bîra ku şerwêl li xwe bikim ne biribû...«

37
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Ji gasînê, Luqmên bang kir:
»Yabo yabo, de ka were! Hûrî hemû li ser bênderê bûne rêz, pîrek der-ketine ser xaniyan, em hemû li hêviya te ne...«
Luqman nixuriyê Heso bû. Çil û sê salî bû. Mirovekî ji xwe razî û hinekî jî dengbêj bû. Dengê wî dişibiya dengê Îsa Berwarî.
Armanca Luqman ku bavê xwe têxista nav ref û garankî bimeşiyana da ku kulkulî diyar ne kiriba. Lewra li cem eskeran bikuliya jî xem ne dikir. Çimkî dijminan wê ev seqetiya ha di derbarê lêdanê de bihesibandana. Heso ev bîr ne biribû. Luqmên bêhna xwe teng kir, ji komê veqetiya û bi bazdan hat hindur:
»Yabo Xwedê ji te razî be, eger tu ê bê were, na eger tu ê neyê em ê herin. Te em bi dereng xistin...«
»Lawo temam temam. Tu ka derkeve ez ê va bêm. Qîza min Meyro, tu

jî derkeve.«
Hindur bi wî û jina wî ma. Heso wek zarokekî xwe xist himbêza Sarê, bi herdu destên wê girt, danî ser dilê xwe, eciqand û bi kelûgirî got:
»Sarê ez xulamê te bim, ez kolê te bim tu ê neyê nav eskeran. Binere vî qewadê qomandarê hidûd qebza demaçê li serê te xist, serî şikest. Dikarîbû tu bikuşta jî. Wilehilezîm eger di vê carê de jî tu derkevî himberê wî qewadî, wê te bikuje. Sarê ji min re soz bide, gidî ji malê dernekeve ez di bextê te de...«
»Na na, ez dernakevim.«
Heso li ser gotina Sarê şerwal li xwe kiribû. Şerwal qahweyî bû. Mirovekî wek tayikekî dirêj, zirav û li hevhatî bû. Bi wê rîha xwe a melkesî, derba fîlozofan pê diket. Sarê gava ew kiribû dilketibûyê. Heso jî dilketibûyê. Şerwal lêdiçû; lê ne di vê carê de. Navrana şerwêl hinekî ji qiyasê der, fireh û daketîbû. Gava dimeşiya bê li nav şeqan dixist navran ji paş ve mîna sîwanê vedibû; gavên ku girs diavêtin, sîwanê radigirt hûr dihûnand, meşa wî dibû wek a siltanan. Qutikê wî ji kirasê Meyro şê bû. Jina Luqman Fatê, berstik dirêj û girover qusandibû. Qutik ji qutik bêtir dişibiya berdilka zarokên dibistana gund. Berstikan xwe berdabû heta bi serê çiçikên wî; ji dûr ve mîna du xencerên kalankirî diyar dikirin. Xwestibû ku sako li xwe bike, lê Sarê ne hiştibû. Çakêtê Temo lê kiribû. Şekala derbê şimikî di lingan de bû. Xwe xistibû talda Luqmên û hevalbendê xwe Xelef, di nav komê de ditewtihî û ber bi komutan de dihat. Komutan bi zirt:
»Pîsên heram bi lez werin! Li dor du seetan çêbû ku ez li vir li bendî we
38

sekinîme! Bênamûsino, bêşerefino ê ne ez ê we bixwim, bixwim bixwim!..«

Komutan her gav, berî ku dest bi lêdanê dikir, bi haweyê ku wan ji desthilanîn bixîne, pir xeber didan. Gundî baş nas dikirin. Serê berberiya di gund de kê û ne kê dikişand? Û mamosteyên fêrgeha fîtne û fesadiyê kî bûn? Nas dikir. Di keft û lepta gundiyan de derdixist ku xelkê herêmê, çendî jê ditirsin! Gava li ser hidûd dibû teqîn, di van kêlîkan de gundiyan çawa xof digirt, zarok çawa dilerizîn bi hemî dizanîbû. Tarîxa malbata hûr û pizûran û ên derdor ji Heso û Circîs çêtir dizanîbû. Kultura kurdî dinasî. Navê şahirên kurd, ji van şahiran ên navdar, kî li ku jiya bû û li ku derê bi gor bûbû dizanîbû. Ji xelkê herêmê pir didexisî. Lêbelê ewqasî jî ji muzîka kurdî hez dikir. Heyranê Meyremxana dengbêj û Hesenê Cizîrî bû. Di rojên şem û yekşeman de digel yuzbaşiyê tabûrê li bendava Nisêbînê li ber muzîka Meyremxan û Hesenê Cizîrî araq vedixwar. Bîçer li herêmê xwedî desthilatiyeke bêsînor bû. Xelk, mîna ku cin ji hesin bitirse wilo ji wî û yuzbaşiyê tabûrê ditirsiyan. Bîçer gava bixwesta, dikarîbû di bîst û çar seetan de di nav gundiyan de aşitî pêk bianiya. Çimkî di sala ku Aydin Guzel du mehekî bûbû komutanê hidûd, ji herêmê berberî rakiribû. Bi gundiyan qedemgeh kola bû. Di mala her gundiyekî de qedemgehek hebû. Bi gundiyan dar diçand. Pere ji wan xwestibû ku bi sondajê, li gelek gundan avê ji bin erdê derxîne... Herkesî ji dil û can jê hez kiribû. Bêjeya »Aydin« bi wî ketibû herêmê. Xelkê, navê wî li zarokên xwe kiribû.

Eskeran zoravî têkilhev rêz kirin. Heso û Circîs di serê rêzê de anîn kêleka hev. Di tenişta Luqmên a çepê de Îdrîsê lawê Circîs, di navbera Îdrîs û Temo de Hesûkê lawê Circîs, di temenê de repikî rawestiyabûn. Bedirxan li kêleka xalê xwe Circîs û Haco jî li kêleka xalê xwe Heso cih girtibû.

Bîçer mîna ku gundî hemû mirîşk û ew jî dîk be dorhawêr disûrikî. Ji kîn û buxzê reş vedabû! Çavên wî ji ên beytikekî bêtir dilîstin; çav mîna

du bizotan di kortikan de bel bûbûn. Devê wî ne diket hev bêyefş diax-ivî. Kef bi dev ketibû. Ji peşkên kefa devê wî, rîha Heso mîna daristana ku di bin berfê de bimîne, belek diyar dikir. Mirov ji kufîniya ku jê dihat heybet digirt! Te digot qey ne insan e, mar e ev. Ji rengê insên derketibû. Bîçer, piştî ku ji eskerên xwe re got:
»Di pêşberî van xiyaran de sef bigirin!« çend gavekî ji gundiyan bi dûr ket û bi çavan hejmara wan kir. Dûv re ber bi Circîs ve qedimî; dar di nav

parxwanên wî de werkir û bi weş pehînek li zikê Heso xist. Hejmar her tim bi dêr dibû. Lêbelê vê carê bi pehînê bû.
»Weh ev çi ye! Hejmar kêm derket!!«
Hejmar temam bû, lê wî xwe ji qazî ve xaşomaşî dikir. Tam pêncî û heft pehîn li zikê wan xistibû. Di lîsta wî de ji xwe navê pêncî û heyşt kesî hebû. Ji serî de dizanîbû ku pêncî û heft kes li vir amade bûne. Bêî ku gundî pê bizanibin bi çavan ew hejmartibûn.
Bîçer ji dawiya rêzê bi bazdan ber bi Circîs de çû, li hindama Hemoyê pizûrî terpilî û devdevkî çû erdê. Mîna ku Hemo ew xistibe, awir tê fi-rand; serê xwe bi haweyê ku »Ez ê bêhneke din te bipelixînim kûçik lawê kûçikan«, hejand û dîsa ji Circîs dest bi hejmarê kir. Vê carê jî bi dêr kir. Dar bi hinc diavêt berstika sitû, barînî bi wan diket. Xuya bû ku ji êşkencê zewqeke bêsînor distend; çimkî gava yekî ku barîn jê dihat, wî hejmar dikir dudu û hîn bi hinctir lê dixist. Di vê navê re bi dêr, pehîn jî diavêtin. Hemo ji ber pehînên wî temene xerab kiribû. Ruyê wî ji xwêh-danê şil bûbû. Bi destê xwe ê çepê zikê xwe diguvaşt. Di hindurê xwe de li hev diqulipî, xwûz bûbû. Xwêzî li ser xwêziyê dadiqurtand û diranên xwe bi ser hev de diqiriçandin. Pehîna çaran, xwe bi nav hinavên wî de

kûr berdabû. Qolincan hinav zeft kiribûn, erq dihatênê. Bêhna wî zor derdiket. Hilm bi carekê ve bûbûn ax û keser; ax û keseran mejî xemrevî dikir û Hemo li ser pêyan disekinandin.
Li ser çiyayê omeriyan ewrên ku ji hêla serhedê ve wek latên zinaran perçe bi perçe tên, kom dibin. Piştî ku xwe gêr dikin, hêdî hêdî xwe ji hev vedikişînin û bi ezmên de belav dibin. Ro ji ewran diyar nake. Ezman belek bûye. Mîna ku şevê din baran ne hatibe, ji axê hîç bêhna baranê nayê. Teyrikan ji zû de ser bênderan terk kirine. Ne kewek dixwîne û ne jî çûkek li hewa dilîze. Kevok nafirin. Ji çiyê mij bilind dibe. Sura bayekî sar ji devê newalê dide der, goristana gund dialêse û bi ser gund de dix-urbile. Devê newalê mîna devê cenewarekî, bi haweyê ku Zorava dabeli-hîne ji hev bûye! Gund qerisî û rûsar e; bi tenê ji bixêrîka Cemşîtê şivan dixaneke reş hilor dibe. Xuya dike ku tepikan dişewitînin. Dixan di nav valaya ezmên de zû belav dibe. Zarok mîna pelên daran diricifîn. Belkî jî ev ricif ne ji sermê be. Lêbelê bavên wan ji xwehdanê bûne av. Dayik ji xwêhdanê bûne av. Li kabên xwe dixînin, neperûşkan ji ruyê xwe didin, porê xwe dikişkişînin. Tew hin ji wan, por bi ser xwe de kur dikin. Bi sên-ga xwe girtine û berzûrî Xwedê dibin.
Heso serê xwe bilind rakir û bi haweyekî ji xwe razî peyivî:
40

»Komutanê min bibexişîne, ma ez dikarim bi te re hinekî serbest biax-ivim?« Komutan ber pê de çû, darê xwe tam di zikê wî rakir, madê ku tirş bû tirştir kir û bi zirt:
»Erê tu dikarî serbest biaxivî!«
Heso êdî mîna şevê din ne ditirsiya. Ji komutên sawa xwe revandibû. Serê xwe bi ser komutan de tewand, ziq li çavên wî nerî û bi herdu destan:
»Tu baş dizanî ku li vî gundî tu mirov qaçaxê nake. Ji bo xatirê Xwedê

û pêxember bes e te em helikandin!..«
Ew hîn wilo diaxivî dixwest bibêje, »Em jî ji vî welatî ne, em salyana xwe didin dewletê, em ji dewletê re eskeriyê dikin; me ev welat ji destê kafirên ingilîz û frensiyan xelas kir, bes vê zilmê li me bike!..« komutan xwe ne girt, bi dev û pê û lepan êrîşî ser kir û ew da ber hev. Ji xwe Heso hîn bi kulma pêşî re li erdê veziliyabû. Rîha wî ji qurm de zeft kiribû û serê wî li erdê dixist. Sûcekî mezin kiribû. Bi komutanan re, bedêla xe-berdaneke wilo, kuştinbû. Circîs jî bi vê lêdana ku Heso dixwar, kêfa xwe dianî û di bin simbêlan re dikeniya.
Heso cara ku damara wî a mêraniyê digirt, dida nav. Lêbelê ew damar ji sedî sed kin bû, ji ber ku di cih de jî poşmaniya xwe dianî.
»Begê min, begê min gotinek bû û ji devê min reviya; min efû bike, efû efû...« Fêde ne kir. Bîçer piştî ku têra xwe lê xist, got:
»Lawê min esker, zû wê lîsta navan werîne!« û wek qantireke şemûs li dor xwe zîvirî. Ji zîqîniya potîna wî, Sadiq diranên xwe bi ser hev de diqir-içandin.
Emirberê wî Hesen Çawîş, bi lez dosyeke mezin da dest. Bergê dosyê reş bû. Mîna ku dosya kevin bû, qiraxên wê ên çepê hinekî kelpitî bûn. Bîçer nola karmendê hecizê, pel li hev qulipandin û bi qêrîn:
»Ez ê aniha navê we hemiyan bixwînim: Ê li vir ‘ez li vir im’ bila bibê-je! Dengê min tê we pûştino!«
Ji bilî Heso, Circîs û mele Salar hemiyan:
»Dengê te tê me qomandarê min« got û komutên dest bi xwendina na-van kir:
»1. Circîs Aslan!«
»Li vir e.«
»2. Ridvan Aslan!«
»Li vir e.«

»3. Hasan Aslan!«
»Li vir e.«
41
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»4. Necîm Aslan!«
»Hihi qomandarrr!«
Ji bêvila Necîm xwîn dihat. Xwe daqûl kiribû û bi herdu destan bêvila xwe zeft kiribû.
Komutan dosye firand ser çavên Circîs, kulmek pê ve zeliqand û mîna marekî teyar ber bi Necîm de herikî:
»Qewad lawê qewadan, tu çawa dikarî wilo bi min re biaxivî!..«
Necîm xwest ku bibêje »Qomandarê min, yaho wilehî min ne ji tiştekî wilo got«, komutan rê neda axavtina wî, xwe metroyekê ji erdê bilind kir û cotikî pehîn avêtin nav şeqên wî. Necîmê şêstsalî sê, çar qulpan di ser hev re qulipî. Bi qulipandina pêşî re çena wî li kevir ket; taximê diranan ji dev pengizîn. Mîna gayê ku xerab ketibe, li ser piştê veziliya û bi dest û pêyan li himber darên wî kêferat kir.
»Temenê xerab nekin! Xweşik bersiva min bidin pûştino!« got û dîsa dest bi xwendina navan kir:
»5. Etman Aslan!«
»Li vir e.«
»6. Cemîl Aslan!«
»Li vir e.«
»7. Halîm Aslan!«
»Li vir e.«
»8. Cidan Aslan!«
»Li vir e.«

Bîçer pelxemek di Cidhan de werkir:
»Ev çi nave?« got û virikî darê xwe avêtê. Darê wî li ser çavê Helîmo ket.
»9. Cemşît Aslan!«
Wî bi dengekî pêt:
»Temamdir Cemşodir qomandar im.«
Bîçer ji cihê ku sekinîbû got:
»Ooohe çêlê« û pê ve qedimî.
Pêşî bi guhê wî girt û firkand. Dûv re kulmek avêt devê wî û dîsa çû di pêşberî Remo de rawestiya. Xwîn ji devê Cemşît herikî. Newêrîbû xwîna xwe paqij bikira.
»10. Bedran Aslan!«
»Li vir e.«
»11. Remo Aslan!«
»Li vir e.«
42

Circîs bi hêdîka pişta situyê xwe xwirand. Xwe bi ser hev de şidand, xwest ku biaxive, dev ji axavtinê berda û bi lez destê xwe ê rastê avêt kêle-
ka xwe a çepê. Sipiyek girt. Sipiyê xerab dev lê kiribû. Şûna geza wê bi qasî mohrekê fireh, kew vedabû. Xwe dixwirand û di dilê xwe de digot
»Mîratê, ma niha wextê vî îşî bû qey!«
»Qomandarê min efû bike; ma ez dikarim tiştekî ji te re bibêjim?«
Bîçer dosye da dest Hesen Çawîş û li pişt Circîs sekinî. Piştî ku bi hej-
mar pênc dar li termaza wî xistin, ji Hesen Çawîş re »dewam bike« got.
»12. Osman Aslan!«
»Li vir e.«
»13. Ahmet Aslan!«

Ehmed bêhnçikyayî destê xwe bilind kir:
»He he qomandar!« got û serê xwe berda ber xwe.
Bîçer bi bazdan li ber sekinî. Bi herdu milên wî girt û bi qahr kaboka xwe di zikê wî werkir. Ehmet wek çûkekî firiya dera ha û di ser hev re qulopazîbû.
»14. Îbrahim Aslan!«
»Li vir e.«
»15. Celîl Aslan!«
»Li vir e.«
»Rawest e!« Çawîş veciniqî, devê wî ket hev û li komutên nerî.
Komutan pêşî serê dêr di devê Circîs de rakir, dar qederê tiliyekê di devê wî de çû. Dûv re jî bi zirt:
»Tu serbest dikarî bibêjî bê te ê çi bigota!«
Circîs di bin çavan re li Heso nerî. Heso mîna ku dizanîbû Circîs wê çi bibêje, xwe avêt wê navê û peyivî:
»Qomandarê min di axuran de heywan helikîn; destûrê bide ku pîrekên me van heywanan derxînin çêrê.«
Komutan xwe çirçirand û xwe çitikî li erdê xist:
»Dîsa tu, dîsa tu ha!« got, şiqamek di Heso werkir û berê xwe dîsa da Circîs. Vê carê jî bêî ku dar têxe devê wî, emir kir:
»Bibêje!«
»Bi rastî min ê jî ew gotin bigota qomandarê min.«
Wî dizanîbû bê ew gotina kê dubare dike. Ji qazî ve:
»Kîjan gotin?«
Heso di çepê Circîs de rawestiyabû. Circîs berê xwe da hêla rastê û bi herdu destan Heso işaret kir:

»Gotina vî zilamî yanî.«
Bîçer bi herdu kêlekên xwe girtin, oxînek kişand û li ezmên nerî.
Ewrên reş û sipî xwe bi ser Zorava de nêzîk berdabûn û digeriyan.
Mîna ku ewran bi heyvê re dilîst; geh xwe dadidan ser heyvê heyv dinix-umandin geh xwe diavêtên jor, heyv li jêra xwe dihiştin, mirov tê dernedixist ku heyv li jora ewran an ewr li jêra heyvê dimînin.
Bêî ku Circîs bibersivîne:
»Lawê min esker, ji cihê ku tu lê sekinîbû bidomîne« got û ber bi Sadiq de meşiya.
»16. Cimo Aslan!«
»Li vir e.«
»17. Îdrîs Aslan!«
»Li vir e.«
»18. Hesûk Aslan!«
Hesûk di tenişta Sadiq de rawestiyabû. Te digot qey dixwaze tiştekî bibêje, lê mîna zarokekî serşîrî dev nagere. Ziq li Çêwîş dinerî û deng ne dikir. Çawîş du caran navê wî xwend. Sadiq ziqitand Hesûk ku biaxive, lê ew dîsa bi xwe şiyar ne bû. Sadiq ji dêvla wî ve got:
»Hesûk Li vir e« û digel Ehmedê hûrî bi dizî kire piste pist:
»Hevalê we ji desthilanîn ketiye birako.«
»Wilo mebêje Sadiq, Hesûk dîkê neqeba ye«
»Tirtir, erê lo tu rast dibêjî. Di wextekî de dîkekî min î qoqo hebû. Karê wî ji sibehê heta ku dibû êvar, wê li hewşê zelq bikira û piştî ku zelq dikir, îcar hildikişiya ser neqebê û ziq li zelqa xwe dinerî...«
Ehmed bi Sadiq re nikarîbû derxista serî. Bi qerfan himberê Sadiq, Mîrzoyê mitirb û Remo bû. Sadiq û Remo ji tirsa serekmalbatan nikarîbûn digel hev biaxiviyana. Mîrzoyê mitirb jî dûrî wî bû.

Hesûk hîn bi xwe şiyar ne bûbû. Bîçer li ber rawestiya. Xwe li ser lingê rastê zîzikand û heta ku jê hat şiqamek tê firand. Şiqama wî dengê çapiliyekê veda. Barînî bi Hesûk ket û bi ser Sadiq de kumişî. Sadiq ew zeft kir, ne hişt ku bikeve erdê. Bîçer dîsa lê xist, lê vê carê jî bi dar û pe-hînan.
»Hewarê qomandarê min! Ma sûcê min çi ye, sûcê min!..«
Komutan dizanîbû bê çi dike. Armanca wî lêdan û çavtirsandinî bû. Hesûk, Hesen Çawîş ne bersivandibû. Ji komutên re li hev hatibû. Piştî ku ew baş nermijand:
»Çawîş dewam bike got« û li ber Sadiq sekinî.
44

»19. Sabrî Aslan!«
»Li vir e.«
»20. Fesîh Aslan!«
»Li vir e.«
Bîçer ber bi Fesîh de çû:
»Îcar ev çi nav e qûn! Tu çima vî navê xwe ê qûnekî naguherînî h?!« got û kulmek li defa sênga wî xist. Fesîh serqûnkî ket, bi sênga xwe girt û serê xwe xist erdê. Bêhnekê wilo ma. Dûv re dîsa rabû ser xwe, lê qiloç sekinî.
»21. Haco Aslan!«
»Li vir e.«
Hesen Çawîş tiliya xwe danî ser navê Bozan, li jora gund nerî û bi xar dîsa dest bi xwendinê kir:
»22. Bozan Aslan!«
»Li vir e.«
»23. Esat Aslan!«
»Li vir e.«

»24. Şakîr Asma!«
»Li vir e.«
»25. Ekrem Kaçar!«
»Li vir e.«
Bîçer xwe bi ser hev de guvaşt û qêriya:
»Ulen Kaçar! Bazde bê tu çiqasî xurt e!«
Ekrem fêm ne kir. Li sênga xwe xist û bi tirkiyeke têkil kurdî:
»Yaho wilehî qomandar, ez Ekremdir Ekrem!«
Bîçer bêî ku tiştekî bibêje, darek li hestiyê çîmê wî ê birçî xist û xwe paş de çeng kir. Şemitî. Lêbelê zû bi xwe ve giha, ne ket.
Di vê navê re pîrekên taxa jorîn jî dabûn dû conegayekî sor û xişin. Conega dioriya û di derdora xwe de poş werdikirin. Piştî ku conega poşek li zikê jina Kazimê pizûrî Hilalê xist, berê xwe rast da nav koma eskeran, oriya û bi telebê hat.
»Lawê min nobedar! Wî bikuje!«
Du eskerên bi G3 li ber conegayê Kazim veteqilîn û lê girêdan. Conega bi çar gulan avêtin erdê.
Kazim bi kelûgirî:
»Qomandarê min destûrê bide me, da em wî ser jê bikin; xebînetê bila heram neçe.«
Bîçer xwe li vê gotinê hayî ne kir. Ber bi Heso û Circîs de meşiya, darê

xwe hejand û bi qahr:
»Ev conegayê lawê kîjan teresî bû?«
Circîs devê xwe tije kir ku bibêje »Ez nizanim«, Heso berî wî peyivî:
»Te conegayê min kuşt. Îcar bihêle ku em ser jê bikin...«

Gava ku Heso diaxivî, wî jî serpozka potîna xwe bi hinc li erdê dida. Ji serpozkê pirik bi ser Heso de çeng dibû. Mîna ku Heso virikî bû be, nav şeqan ji pirikê zer dikir.
Bîçer artîskî çû û hat:
»Tereso hîn diaxive jî hi! Ji dêvla ku conegayê xwe ê bêterbiye di êxur de girêbida, tew îcar wî diparêze jî!..« û li ser hev pênc şiqam li şûna hev dan.
Heso ji ber şiqamên wî tewtihî û gêj bû. Her ku wî şiqamek lê dida, ew rimekê çeng dibû. Bi şiqama dawî re serpiştkî li erdê veziliya û bi paş serê xwe girt. Serê wî li qiraxa tahtê ketibû. Serî ne şikestibû, lê bi qasî hesh-esûkekê werimî bû. Kubika werimî di serî de ji dûr ve diyar dikir.
»26. Hamît Tilkî!«
»Li vir e.«
»27. Feremez Kartal!«
»Li vir e.«
»28. Bahyeddîn Kuş!«
»Li vir e.«
»29. Fehmî Tavşan!«
»Li vir e.«
Bîçer herdu destên xwe pev re hildan:
»Hop hop, ev çi qewimî yaho! We vir tij heywan kirin, heywan lawê heywanan!« û xwe bi ser hev de kilkiland.
Hesen Çawîş rawestiya û çavên xwe li ser komê gerandin. Di lîsta wî de navê mamoste û melê gund bi qelema sor hatibû nivîsandin. Gava navên ku bi qelema sor bihatana nivîsandin, wê rabestinên komutên li himber van bi temamî cihê ba. Lê digel ku navê melê bi vî haweyî nivîsandîbû, dîsa jî mele ji gundiyan venediqetand û nola ku di gundiyan de dikir, wi-lo di wî de jî dikir.

»Komutanê min, ez îmam Salar Yilmaz di nav komê de nabînim.«
Salar ji dera ha bang kir:
»Ez li vir im, Çawîş qomandar!« û bin çengê xwe ê rastê xurand.
Bîçer, xwe wek dîkê elokan nepixand:
»Ooo hezretî îmam, te şaşik avêtiye ev çi mesele ye? Qey te dev ji
46
îmametiyê berdaye?..«
»Na, ez hîn ew îmamê berê me.«
»Baş e naxwe ka şaşik û cubê te?«
»Min şaş û cube avêtin.«
»Çima?«
»Li gundên ser keviya hidûd îmametiya bi şaş û cube gunehkariyê dide mirov.«
»Bêşeref hinekî vekirî biaxive vekirî!»qîr da û darê xwe di devê wî rakir.
»Berî bi du mehan gava te dîsa girtibû ser gund, eger di bîra te de were, te bi xwe bi ser cube û şaşika min de mîztibû. Cube û şaşika ku wê mirov bi ser de bimîzin, ez nikarim bi kar bînim.«
»Qewad, bêhna xwe fireh bike, ez ê niha di devê te de jî bimîzim!«
Mele nefret ji eskeran dikir. Berzanî bi dîn û îmana xwe ne dida. Bi qasî alimtiya xwe ewqasî jî mêr bû. »Herçi tirk û ereb in ne misilman in«, goti-na wî bû.
Piştî ku Bîçer çend kulmisk avêtin çena mele, herdu dest bi hev re bilind kirin û Hesen Çawîş dîsa dest bi xwendina navan kir:
»30. Salar Yilmaz!«
»Li vir e.«
»31. Nezîr Gul!«
»Li vir e.«
Bîçer bi guhê Nezîr girt û firkand.

»Bê çi gulek xweşike lawê diya xwe« got û heta ku jê hat şiqamek li ruyê wî xist.
»32. Heso Kaplan!«
»Li vir e.«
»33. Lokman Kaplan!«
»Li vir e«
»34. Bedîrhan Kaplan!«
»Li vir e.«
»35. Temo Kaplan!«
»Li vir e.«
»36. Casim Kaplan!«
»Li vir e.«
»37. Simo Kaplan!«
»Li vir e.«
»38. Sadik Kaplan!«
47
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Li vir e.«
Bîçer piştî ku ji Hesen Çawîş re got »Bisekine, bisekine!« ji ba Heso bi bazdan hat û di nîvê rêzê de sekinî.
»Madem nav û mavên we piling e, Simo binire bê ka tu çiqasî dişibî piling!«
Simo hema bi gotina wî re, niriya. Bîçer cidiyeta xwe xerab ne kir.
Işaret da Hesen Çawîş ku dîsa navan bixwîne.
»39. Halef Kaplan!«
»Li vir e.«
»40. Selîm Kaplan!«

»Li vir e.«
»41. Şehmus Kaplan!«
»Li vir e.«
»42. Hutu (yanî Hûto) Kaplan.«
»Bîr oldî qomandar! (bû yek)«
Hûto li Îzmîr Narliderê sê salan eskerî kiribû. Lêbelê bi tirkî ji »bîr oldî« pê ve tu tiştekî din hîn ne bûbû. Komutanê qerargehê, Hûto li dor pênc mehan xistibû dibistana Ali okulê, lêbelê Hûto dîsa jî fêrî tirkî ne kiribû. Bîçer bi vî aliyê Hûto dizanîbû. Pêşî beşişî. Dûv re bi hêrs:
»Te çi got, te çi got?«
Bîçer hîn wilo diaxivî Hûto li ser hev:
»Bîr oldî qomandar bîr oldî...«
Komutan ji qelafetê Hûto ditirsiya. Hûto bi rastî jî Hûto bû. Li bavê xwe çûbû. Wek dêwekî mezin bû. Navê bavê wî jî Hûto bû. Komutên ji dûr ve piştî ku tifek tê werkir, »Min pir dewar dîtin, lê yek ji van dewaran jî ne bi qas te bû« got û işaret da Hesen Çawîş.
»43. Kerîm Kaplan!«
»Li vir e.«
»44. Hemo Kaplan!«
»Li vir e.«
»45. Kazim Kaplan!«
»Li vir e.«
»46. Zubeyîr Kaplan!«
Ji tirsan devê Zibêr ket hev û gotin di dev de asê ma. Bîçer ev aliyê wî ferq kir. Li ber rawestiya û bi qewet şiqamek li ruyê wî xist. Zibêr bi şiqa-ma wî re vebû.
»Li vir im begê min« got û çik sekinî.
48

»47. Mahmût Kaplan!«
»Li vir e.«
»48. Nurî Kaplan!«
»Li vir e.«
Heso ji lêxistina ku xwaribû sergêjî bûbû. Xwe li tena ne digirt. Qeweta kelaxê xwe bi carekê ve berdabû ser gopêl û dilerizî. Li xwe danetanî ku destûra rûniştinê ji komutên bistîne. Pê ne diket; çimkî dijminê wî Circîs ev yeka ha wê wek qelsiyekê bidîta. Heso bêhemdî xwe ji hindam de li ser
qûnê ket. Xwest ku rabe, lê nikarîbû.
»Ew çi ye Heso efendî? Ma te emir ji min xwest ku tu rûdine, ha!..«
Heso bi serê lêvan:
»Ez westiyam qomandar beg...«
Di aliyê rohilatî bêndera jêra gund de berqef hebûn. Eskeran êşkenceya herî giran di bin van berqefan de li gundiyan dikirin. Bîçer, Heso ji komê veqetand. Nikarîbû bimeşiya. Eskerekî zendên wî bi qayişê şidand, bi dû xwe de kişkişand û ber bi berqefan de bir.
»49. Ramazan Kurt!«
»Li vir e.«
»50. Mesut Kisa!«
»Li vir e.«
»51. Kasim Yaman!«
»Li vir e.«
»52. Mihyeddîn Serçe!«
»Li vir e.«
»53. Sîrac Kara!«
»Li vir e.«

»54. Mîrzo Aydin!«
»Li vir e.«
»55. Kener Acar!«
»Li vir e.«
»56. Alî Yaman!«
»Li vir e.«
»57. Seyithan Geyik!«
»Li vir e.«
Gundê Zorava bi zarok û jinan hinekî qelebalix bû. Bi giştî li vî gundî zewac ji sêzdeh û çardehan dest pê dikir. Ji derveyî xortên ku li bajêr dixwendin, ji nexwenda mirovên azib tune bûn. Di her malê de, bi kê-

manî çar, pênc zarok hebûn. Di lîsta komutanê hidûd de ji zarokên di pêçekê de bigirin heta ku digiha kalên sedsalî, navê herkesî hebû. Ji bilî van wekî din di gun de çend pez, ker, qantir, bergîl û dewar hebûn li ba wî nivîsîbûn. Di çiyê de çend kunên keftar û roviyan, şikeft û berqef hebûn; bi hemiyan dizanîbû. Her meh başçawîşê Sitilîlê di derheqê hej-mara sewêl û zarokên nûçêbûyî de ji muxtarê gund agahdarî distend.
»Hejmar temam e! Esker bi vir de were!«
Circîs di bin boqê simbêlan re keniya û di dilê xwe de got:
»Wey mala Xwedê hezar carî ava ku doh ez li Nisêbînê nemam. Xwedê ez ji beleyek mezin filitandim! Baş e, min ê îro çi xwelî li serê xwe kiriba! Min ê çawa ew qanih kiriba ku şevê din min li hidûd ne xistiye, ez li Nisêbînê mêvanê Qalûndirêj bûm? Ya rebî bêlome be! Ez ê mûlidekê bikim setqe; ez ê bizina kol ser jê bikim...«
Esker ber bi gundiyan de hatin, darê xwe hejandin û awir di wan fi-

randin. Tevzînok bi laşê gundiyan ve hildikişiyan; ji tirsa ku bêhneke din wê afatiyeke çawa mezin bi serê wan de bê, hemû ketibûn tayê. Ji Hemoyê pizûrî dilopên mîzê dihatin xwar. Îdrîs leganeke nîsk xwaribû. Zikê wî nepixîbû; xwe bi ser hev de diguvaşt da ku ba ji ber neçe. Temo lêva xwe dicût. Sadiq ketibû xeyal û gumanan. Şensê wî hebû ku Bîçer xwe ji bîr kir û lê ne xistibû. Devê Sadiq ê ji hev, devê şikefteke kufarî di bîra mirov de dianî. Mirov ji ruyê wî ditirsiya. Bedranê ku şêwirdarê Circîs bû û bendayetî digerand, mîna qîrê reş xeriqî bû. Te bi serê bêvilê bigirta wê biketa. Kabokên Hesûk fisiyabûn; bi zor xwe li ser pêyan radigirt. Mele Salar tehemûl ne dikir ku li eskeran temaşe bikira; serê xwe berdabû erdê û bêyefş diran diqiriçandin.
»Nîzama lêdanê bigirin qahpino!«
Gundiyan dizanîbû ku pêşî wê ji kîjan babetî lêdanê dest pê bibe. Hemiyan bi hev re herdu destên xwe dirêj kirin. Esker ji hindama xwe de rabûn ser lingekî, dar bilind kirin û bi hêl li destên wan dan. Reqîna daran li ser Zorava mîna şerê koçanîkên benpaç dilîland û deng vedidan. Xuya bû ku pir ji wan bi kîn bûn. Kîna wan di dev û çavên wan re dabû der. Bi lêdana dêr re ditengijîn; çavên wan ji xwînê tije bûbûn û kef bi devê wan ketibû. Mîna motorê ku bixebite û hîn dewra xwe ne sitendibe, her ku darek li wan dixistin, qeweta xwe ji darê ku bi dû darê din de dihat digirtin. Ji bilî Circîs, Temo, Sadiq û Salar hemiyan qîr didan. Dest û zendên Circîs yekser reş û şîn bûbûn. Zendên wî xwe li hewa ranedigirtin. Dest û zendên Salar mîna du rêsiyan pê ve daliqiyayî mabûn.
50

Lêbelê digel vî haweyî dîsa jî kipîn ne diketê.
Bîçer got:
»Esker rawest e!«

Helke helk bi eskeran ketibû. Mîna hespê ku tu bibezînî û tu nikaribî serî ragire, hin eskeran digel ku komutan emirê rawestinê dabû, dîsa jî darê xwe ketûber di derdora xwe de werdikirin. Piraniya gundiyan ji ber derbên darên wan, destên xwe xistibûn nav şeqên xwe û li erdê bi ser hev
de diqulipîn. Îdrîs li erdê tot ketibû. Hesen Çawîş serpozka potîna xwe xistibû devê wî û digot:
»Gotina ku te berî niha ji min re gotibû bi deng bibêje kûçik!«
»Min ji te re çi gotibû?«
»Bêşeref xwe xazî neke! Te ne got ku Hemo Kaplan bi vê bûyera şevê din agahdar e!«
»Wilehî min ji te re tiştekî wilo ne gotiye...«
Pîrekên gund li taxa jor û navê li hev kom bûbûn. Li kabên xwe dixistin û porê xwe dikişandin. Sarê jî hilkişiyabû ser xênî, lingên xwe li erdê dixistin, bi erdê re pevdiçinî û li eskeran geft li ser geftê dixwar.
»Esker hûn amade ne!«
»Em amade ne komutanê min!«
Gundî yek li pişt yekî sekinandin. Li her gundiyekî eskerek siwar bû û ber bi jora gund de meşiyan. Circîs di pêşiya karwên de bû.
»Lawê min esker, ka binere bê ew pîrek çi dixwaze?«
Ê esker bi bazdan çû û li ber Sarê rawestiya:
»Xwe ji ser conega bide alî, biceheme tu li vir çi dikî!«
Hejek di destê Sarê de bû. Ji bîr kiribû ku darê xwe ê benkan bîne. Hejê xwe bi ser ê esker de hejand û bi hêrs:
»Ev hûn kafir in, hûn misilman in hûn çi teba ne? We conega kuşt, îcar bihêlin ku em ser jê bikin...«
Heso ji tirsa ku Sarê winda neke û Circîs jî ji tirsa ku komutan derbekê li wî nexîne, hindik mabû zimanê xwe daqurtînin. Sarê jina Heso û xwe-

ha Circîs bû. Dikarîbû bûba sebebê kuştina wan. Bîçer helwesta Sarê fêm kiribû. Karwan sekinand û ber bi Sarê de meşiya.
»Dêlika heram zû here mala xwe! Binere ez ê te biçirînim ha!« got û bi hinc pehînek li zikê wê xist. Sarê serpiştkî ket û bi lez rabû ser xwe. Piştî ku bi kîn tifa xwe tê werkir:
»Lawo, wileh tu ne tu zilam î, lê ez çi bikim! Hema ez kîrê te têxim dê û jina van hemiyan û hew!«

51

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Berê xwe da tara jor û çû. Çend gavekî çû ne çû, li paş xwe zîvirî û dîsa bi hêrs got:
»Hûn ji hev re xurt in şêrgeleno! Îcar qey bi rastî jî Xwedê ne li ser heqiyê ye, gerek ez zilam û hûn jî pîrek çêkiribana...«
Bîçer demaçe lê kişand. Heso bi qêrîn »Na na!..« got û wek teyrekî firiya ber. Xwe xist devê demaça wî û situyê xwe li ber tewand.
»Min bikuje, wê nekuje. Pîrekeke dîn e. Her meh em wê dibin Xerpêtê ser textorê dînan. Ez xulamê te bim wê nekuje...«
Sarê jî sênga xwe ji demaça wî re vekiribû û diqêriya:
»Eger tu min nekujî ez keran berdim ser jina te! De bikuje! Bikuje, belkî ev bêşerefên han hinekî cesaretê ji min bigirin! Bikuje!..«
Gotinên Heso û kefa ku bi devê Sarê ketibû, Bîçer nerm kir. Bawerî pê anî ku bi rastî jî Sarê dîn e. Pîrek, zilam, zarok tu kesî nikarîbû bêemiriyeke wilo li himber komutanan bikira. Li Zivingê sê sal berê, pîra Kesûma bi destê komutanê hidûd Ali Uçuran hatibû kuştin. Ew jî jinek wek Sarê bi mêranî bû. Li himber êşkenceya Uçuran derdikeve û Uçuran jî di nav koma gundiyan de cercûr lê vala dike. Li gor wan, Sarê bi wê ser-hildana xwe, kuştin heq kiribû. Eger Bîçer ji zimanê wê fêm kiriba, dîn

ba jî dikarîbû bikuşta. Çimkî komutanê tabûra Nisêbînê jî dînek kuştibû. Şeva ku Hinanoyê dîn li sûka Nisêbînê şevder dimîne, ew û komutan pêrgî hev tên û bi tirkî jê re dibêje »Tu komutan bî, ez jî başkomutan im. De here bi rêya xwe de!« Komutan jî cercûrê demaça xwe di serê wî de vala dike.
Mehmet Fatîh, li Circîs siwar hatibû. Fatîh mîna bertelaşekî dirêj û ewqasî jî xişin bû. Circîs jî mirovekî kin bû. Eger Circîs ne ji lêdana ku xwaribû û dest û zendên wî ji taqet ne ketibana, bi wê yextiyariya xwe dîsa jî belkî bikarîba rahişta Fatîh. Lêbelê ne Fatîh û ne jî komutanê wî, ne dixwest li êşa ku canê Circîs bi carekê ve zeft kiribû, hayî bibin. Hemiyan jî yextiyariya wî ne didît. Circîs kumişîbû erdê û qûn belot kiribû. Fatîh jî li ser pişta wî rûniştibû û mîna ku biziqitîne kerê bi darê xwe ew diziqitand. Circîs hêl dida xwe ku rabe, lê kelax bi a wî ne dikir. Lingên xwe ber bi xwe de dikişandin, xwe dida ser hev û ji nişkê ve teqil dida xwe; kabok difisiyan û dîsa deverû dikişiya erdê.
»Îmam tiro! Ma gelo, li ser pira selatê mirov li keran an li çêlekan siwar tê?«
Salar ji wahca nava xwe xwîn digiriya. Belkî ji herkesî bêtir wî lêdan xwaribû; lê ji herkesî bêtir dîsa jî wî zeximtir xuya dikir. Di bin Ali Resulê
52

heyştê û du kîlo de, mîna ku hîç lêdan ne xwaribû, rehet dimeşiya.
»Hezretî îmam, ez bi te re diaxivim qeşmer! Ma qey deng nayê te!..«
Salar di dilê xwe de got, »Kuro eger ez xwe û te herduyan nexînim, bila ez ji te bêşereftir bim lo.« Û bêhnikek ne ket wê navê, xwe bi ser teniş-
ta çepê de avêt erdê. Resûl bi xwe re ne giha ku destan ji xwe re bike mer-
tal; da ku serê wî li erdê nekeve. Baş bû ku eniya wî ne li ser cihekî bi zix-

ur an li tahtekê ne ketibû. Lêbelê çepilê Salar ê çepê bi ser hev de ecinîbû. Çepil di bin ê esker de mabû. Bazinê destê wî hinekî werimî. Ali Resul piştî ku çend pehîn bi der qûna mele werkirin, »Gapîr pêwîst nake tu xwe bixînî, ez dev ji te bernadim« got û xwest ku dîsa li Salar siwar bê. Salar ling nedan ber xwe. Ali Resul jî bi çepilê wî ê ku ecinîbû girt û bi dû xwe de kişkişand.

»Esker peya bibin!«

Eskerên Bîçer, heta bi ber deriyê hewşa Celîl li gundiyan siwar bûbûn. Navbera cihê ku esker li wan siwar hatibûn û qesira Celîl li dor du sed metrî bû. Gundiyan di halekî ne xweş de xwe gihandibûn vê derê. Gelek ji wan mîna Salar û Circîs ji taqet ketibûn; û eskeran jî herwiha ew bi dû xwe de xircilandibûn. Ji dev û ruyê gelekan xwîn diherikî. Şerwal û qutikên gelekan ji wan, ji vecircirandinê qetiyabûn.

Esker li hêlekê û gundî li hêlekê, dîsa yek kete pey yekî û sef girtin. Circîs jî li wê navê hîn rûniştîbû û bi doxîna şerwalê xwe daketibû. Doxîn qetiyabû. Bîçer ji cihê ku sekinîbû bi kubarî got:

»Circîs efendî, pêwîst nake tu şerwêl gêrêdî; hema bêhneke din ji xwe em ê şerwêl ji we hemiyan bikin. Rabe ser xwe!« û bi aliyê berqefên rohilatî gund de meşiya. Pênc, şeş gavan ne çû, li xwe zîvirî:

»Bila mirovên bejindirêj li ên bejinkin siwar bibin« û bilez dîsa meşiya. Hesen Çawîş di ber xwe de keniya. Ji nav komê, bi çepilê Hûto girt û li ber Circîs sekinand. Di herêmê de jî mîna Hûtoyê pizûrî girs û dirêj bi tenê Hidigdigê xirbêqeplî hebû. Ev mirov tam du metro û panzdeh santîman dirêj bû. Li gor bejina xwe baş xişin jî bû. Pir xure bû. Ji bilî dema gêra bênderan, her tim birçî bû. Lingên wî çil û neh santîm bûn. Xwas digeriya. Nenûkên xwe bi kelbetên dibirîn. Herxên di binê lingên wî de mîna devê zîhên maran ji serhevçûyî, bêbinî diyar dikirin. Goşt li ser goştê qusyayî qatqatî bûbû. Qiraxên herxan wek sûstên patozê tûj

dibirîn. Ji lingên wî mirov xof digirt! Di wextê bênderan de pizûriyên halxweş, nîskên xwe bi Hûto gêre dikirin. Gundiyan ew wek qirdikekî xwe didîtin. Hûto wek sînema bêpere bû. Di kêlîkên gêrê de piçûk -

mezin temamê pizûriyan derdiketin temaşa wî. Hûto heqkarê xwe pere ne distendin. Xwediyê bênderê jê re bizinek digel serî û pê, hûr û roviyan li ser teşteke girar dikir û li ber datanî. Wî jî piştî ku ev xwarin hemû dixwar, eyarek li nav şeqên xwe digerand û dirêjî nav loda sapê nîskan dibû. Di nav sêp de geh bazdida gah xwe li erdê dixist û geh jî xwe dixi-jiqand. Dema ku Mîrzoyê mitirb di vê rewşê de jê re li ribabê dixist, wî sapê elbeke nîsk di hikmê sê, çar seetan de hûr dikir.
Hûto ji Circîs bêtir dixwest li muxtar siwar bihata. Ji muxtêr dihenitand. Lêbelê di vê siwarhatina niha de, Circîs ba dîsa jî xem ne dikir. Çimkî Circîs mezinê muxtêr bû. Muxtêr li ser gotina Circîs ew teslîmî eskeran kiribû ku eskeriyê bike. Xwe bi ser de daqûl kir ku lê siwar bê, Circîs pêş de pengizî; li derdora xwe nerî û di dilê xwe de got:
»Gelo ne şerm e ku di nav vêqas alemê de ez rahijim vî tewtewê ha? Qaşo ez mezinê malbatekê me. Di bin emirê min de çil, pêncî mêrên bi tiving hene. Eger gava ez bixwazim, bi van mêran dikarim van eskeran tevan bidim kuştin. Ez mirovekî kal û misilman im, ez ê çawa rahijim vî zir fasiqî! Ooh tu jî lo, ev çi aqilê xerabe ye! Ez mirovekî xuyayî me, ez misilman im ew fasiq e, ez nizanim çi me ew nizanim çi ye, ev çi fikarên beredayî ne! Ma qey tu ji dewletê mezintir î lawo? Bi dû Xwedê dewlet tê.
Dewlet vê yekê bi te dike, ehmeq. Ne şerm e, rahijê. Eger tu ranehijê ji xwe wê gavê şerm e. Ha tew yeke din, gava ez ranehijim vî minafiqî, Bîçer

dikare bibe hevalê Heso...« û bi hêrs ket bin Hûto û ber bi berqefan de tewtihî.
Circîs bi selametî barê xwe gihand qonaxê. Lêbelê karwan hîn jî dimeşiya.
Gundî di bin berqefan de tena derpî tazî kirin. Di bêhnika tazîkirinê de tev li Salar, kesî li ber xwe neda. Eskeran mîna ku hemû bi dê û bav nas dikirin û bi salan digel wan jiya bûn, bêî ku ji wan re bibêjin, »Dijmin û dijmin werin kêleka hev«, wan bi xwe mirovên dijmin û dijmin anîn kêleka hev û dudu dudu di ber hev re vezilandin. Dûv re eskerekî telîsek qayiş anîn û li dera ha vala kirin. Qayiş hemû sixtiyan û mîna qûşa kerê qalind, pan û dirêj bûn. Bîçer li pêpîkê xist. Esker hemû ketin temenê. Û wî dest bi axavtinê kir:
»Ev bêşeref tu carî nikarin gotina bi rastî ji mirov re bibêjin. Ji ber ku jiyana wan li ser fitne û fesadiyê ava bûye. Qaçaxiyê dikin. Têkiliyên wan bi temamê qaçaxçiyên Tirkiyê re hene. Heta ez dikarim bibêjim mafiya ku îro li Tirkiyê pêtî daye, hemû bi qeweta teresên vê herêmê ye! Dijminê
54

dewletê ne. Bi dewleta Sûriyê re peyman danîne ku dewleta me birûxînin. Dewleta Sûrî mêl bi nîvheqekî dide wan. Helbet gava çixara Yeni Harman bi wereqe û ribekê be û çixara malboro jî bi vî heqî be, wê milet çixara malboro bikişîne. Ji Sûrî qumêş tînin, basme, cil û caw, pelên şamî, çayê, morîkan û heta bi tiştên xwarinê tînin! Armanca wan ku di warê aborî de dewletê qels bixînin. Dijminê milet û dewletê ne ev!..«
Gotinên wî bi gundiyan xerîb ne dihatin. Ji ber ku li her derê ev gotin dikirin. Heso xwe ne girt, li qûn rûnişt û bi herdu destan:
»Begê min wilehî tu şaş î yaho! Kesek ji me tu qaçaxê nake. Em ne dijminê dewletê ne. Bav û kalên me li ser vê dewletê xwe dan kuştin. Kalikê

min di dema osmaniyan de tam şeş salan eskerî kir. Bavê min li dor çar salan eskerî kir û di şerê ku Atatirk bi ingilîz û frensiyan re kiribû birîndar ket. Bavê min bi yûnaniyan re şer kir, begê min.«
Heso dê gotin anîba ser raperînên kurd ku bav û bapîrên wî li himber van raperînan jî çawa şer kiribû, lê Bîçer êrîşî ser kir. Bi hinc darek li nav piştê xist.
»Gapîr gotinê bibire!..«
Heso mîna çûkê ku teyr di ser re here, defa sênga xwe xist erdê, serê xwe bi jor de rakir û ziq li ruyê wî temaşe kir. Bîçer piştî ku bi serpozka potîna xwe ruyê wî ji ser xwe guhert, pelxemek di Circîs werkir, dûv re hinekî ji wan dûr ket û qêriya:
»Circîs, tu û Heso werin vir!« Herdu li ber sekinîn.
»Circîs, wê dêlika ku berî niha êrîşî min kir xweha te ye, ne wilo?«
»Erê begê min, xweha min e û jina Heso ye.«
Bîçer demaçe ji qewlik kişand, fîşek ajot ber û devê wê xist cênîka Heso. Dûv re bi lingê xwe hinek pîsiya hişk işaret kir:
»Bixwin bêşerefino!«
Heso ponijî û kuştina Sarê anî ber çavên xwe. »Bi telaq ez ji mirina xwe natirsim, ez dikarim nexwim, bila min bikuje. Lê îcar ku min nekuje û Sarê bikuje ez ê çawa bikim!«
Gava ku ev wilo difikirî, Circîs pişka xwe xwaribû jî. Heso jî xwar.
»Esker, hemiyan têxin felaqê!«
Eskeran lingên mirovên ku di ber hev re vezilandibûn, digel hev di qayişan re derbas kirin. Qayiş şidandin, qûnên wan belot kirin û bi daran daweriqandin wan. Qîr û hewarên wan di felekan re derdiketin. Heso û Circîs pişka hev ketibûn. Lingên herduyan di qayişekê re derbas kiribûn. Ev herdu mirovên kal, ji ber jana ku felaqê dida, ziwa bûbûn. Kef bi de-

vê wan ketibû. Lêbelê wek hevalbendên xwe ne diqêriyan. Di kêlîka felaqê de diyar dikir ku Heso û Circîs çendî ji hev dihenitandin. Herduyan jî hewl dida xwe ku kelaxên wan negihên hev. Heryekî xwe bi aliyekî de qulipandibû, devê xwe xistibûn erdê û dev destên xwe dikirin.
Lêdana felaqê deh, panzdeh deqîqeyan ajotibû. Lingên hemiyan wek hebanê nepixî û qusiya bûn. Tilmiqûnên wan terişî bûn. Derpî ji xwînê şil bûbûn. Eger ev mirovên ha di rewşeke normal de bana, bi wan lingên nepixî û qusyayî wan dê tu carî nikarîbana li ser pêyan rawestiyana. Lêbelê hin ji wan mîna ku ji lingan hîç lêdan ne xwaribûn, li wê navê wek singê golik çikilîbûn. Hesen Çawîş jî, Îdrîs xistibû sintaqê û bi lêdanê ha ha jê re digot, »Zû bibêje! Ma te ji min re ne got ku Hemo qaçaxçiyan nas dike, hayê wî ji vê meseleya şevê din heye!..«
Piştî vê lêdanê li ser emirê komutan, îcar dar xistin destê van ên ku digel hev xistibûn felaqê û ji wan re gotin:
»Bi dorê li hev xînin û her ji çar daran dorê biguherînin!«
Kipkipa dilê Remo bû. Hûto û Remo pişka hev ketibûn. Remo dizanîbû bêhneke din wê Hûto çi afatiyê bi serê wî de bîne. Lê Hûto jî ne wek ku Remo difikirî ewqasî mirovekî ne bîrewer û xeşîm bû. Bi destan ji eskeran re işaret dikir û digot, »Bila dora pêşî a wî be, ez naxwazim lê bidim...« Lê fêde ne dikir. Bi wê bergerê sûcê xwe tew hîn bêtir girantir dikir û lêdan dixwar.
Dar di destê Heso de bû. Dora pêşî dabûn wî. Heso pêşî li ber xwe da. Ne dixwest li Circîs bide û xwe piçûk bixîne. Lê armanca Bîçer jî ji xwe ev bû. Dixwest şexsiyeta wan a ku mabû, wê jî têxe bin lingan. Çimkî mirovê dema ku bêşexsiyet jiyaba, dikarîbû her xerabiyê bike. Bedirxan di felaqê de ling hilda bûn û Haco bi dêr li ber rawestiyabû. Di vê bêh-

nikê de dixwest erd veqelişe û ew tê de here xwar. Destên xwe danîbûn ser çavên xwe, fedî dikir li Haco bineriya. Haco jî bi qasî wî fedî kiribû; berê xwe jê guhertibû û serê xwe xistibû ber xwe li erdê dinerî.
»Lan Hûto kaç oldu!«
»Bîr oldî qomandar.«
Remo bi hêrs got:
»Kuro te di diya xwe ku...ayo! Çi bîr oldî, çi pênc oldî, çi deh oldî te ez kuştim lawê kerê! Kuro dahbê heram, xwe ji ser min bide alî haho!..«
Hûto bi rastî jî hejmareke bilind dar li binê lingên wî xistibûn. Eskeran bi vê hejmarê dizanîbûn. Lêbelê wan zewq ji lêdana Hûto distend. Dixwestin her tim dora wî be, da ku bibêjin »kaç oldu« û Hûto jî ji wan
56

re bibêje »bîr oldî qomandar.«
Temamê gundiyan bi daran li binê lingên hev xistibû. Di kêlîkên lê-danê de jî her eskerî ji hindama xwe de digot, »Ên ku şevê din li hidûd xistin, kî bûn? Hûn wan nas dikin...« Gundiyan jî herwiha bi haweyê »Em nizanin...« bersiv dabûn.
Bîçer bêhawe ji çap ketibû. Mîna dînan xwe ji ser vî diavêt ser ê din, li wan dixist û siqêfên kotî dikirin. Keft û leptên wî ên di kêlîkên nuh de, mirov li kêlîkên derbasbûyî poşman dikir. Kêlîkan bi haweyê meşa gêrikê, kêlîkên zilmê digindirandin. Lê dîsa jî roj ji cihê xwe ne diqeliqî. Bûbû risas. Wan ewqas lêdan xwaribû û hîn jî seet ne bûbû duwanzdehê nîvro.
»Bekçî gû! Dema ku qaçaxçî di bestê re bi jor de hilkişiyan tu çima ne ket kemîna wan, hi?..«
»Qomandarê min ez ne ketim kemîna wan, lê min li wan teqand.«
»Tu çima ne ketî kemîna wan û te çend kes ji wan ne kuştin?«

»Ez hinekî dereng bi wan agahdar bûm.«
Bi berstika wî gird. Xwest ku wî bilind bike, ling biavêje ber û bixîne. Lêbelê Remo bi qama xwe ferqeke mezin lê dikir. Dirêj bû. Nikarîbû ew bilind bikira. Da ber weşan. Remo paşûpê çû, lingên wî di hev de werqilîn û li ser piştê totlanî ket. Bîçer hilkişiya ser sênga wî û xwe kil kir. Remo bi qîr û hewar xwe qulipand ser tenişta rastê. Bîçer kumişî; lê zû bi xwe re giha ne ket erdê. Destên wî hinekî bûbûn bi herî. Eskerekî dest-malka xwe dirêjî wî kir. Piştî ku destên xwe ji heriyê pqij kirin, bêdeng sekinî û li herdu destên xwe nerî. Dest li hev qulipandin, hûk kir wan û tilî bi hev firkandin. Kefa destê wî ê çepê hinekî zelhitîbû.
Li gor têgihiştina komutan, Remo bêûsûliyek mezin pê re kiribû. Komutan hildikişe ser sênga wî û ew jî sêngê jê re bernade. Mîna çêlkewê ku sipî ketibin baskên wî, xwe li ber Bîçer pirnisand.
»Qomandarê min bibexişîne, bêhemdî bû. Ji êşa canê xwe bêî ku ez li xwe hakim bibim, min ew hereket kir...«
Bîçer xwe li ser lingekî zîzikand, pelqînî ji ruyê wî anî û qêriya:
»Garaneke qaçaxçî di bestê re dimeşe, temamê gund bi dengê reqîna kevirên ku ji ber simê hespên wan dipekiyan, şiyar dibin û tu bi vê yekê şiyar nabî, ha!«
Remo bi şiqama ku bêhneke berê xwaribû, gêj bûbû û çarmêrkî rûniştibû. Bi temtêleke ku heyvanê mêraniyê li ba nemabe, bi herdu destan serê xwe hişk zeft kir û hilmekê sekinî. Dûv re serê xwe xist nav şe-

qên xwe û bi kelûgirî axivî:
»Qomandarê min, wilehî û bilehî min bi tivinga xwe heta bi qûntara

çiyê daye dû wan.«
»Here tivingê, fîşekan û rapora başçawîşê Sitilîlê bîne, ez ê li wan biner-im!«
Li gor mercên ku qereqolan ji bekçiyan re danîbûn, bekçî gerek nahtorî li gund kiriba; gund ji diz û eşqiyan biparasta û bûba navbeynhatê mux-têr û başçawîşê Sitilîlê. Bekçî wê têkilî malê qaçaxê û qaçaxçiyan nebûya. Ev kar diket mista esker û polîsan. Komutanan wilo digot. Lêbelê gava ku qaçaxçiyan îcar li hidûd dixistin, bi bekçî re tam berevajî gotin dikirin. Çermê binê lingên Remo mîna çilmê mîhê nerm û tenik bûbû. Geh bi çarlepikan û geh jî qulûskirî dimeşiya. Bi halekî ne xweş tiving, fîşek û ra-pora başçawîşê Sitilîlê anî. Çûn û hatina wî a malê li dor neh, deh de-qîqeyan girtibû. Lêbelê Bîçer ev yeka ha wek derengiyekê hesiband û çar şiqam pê vekirin.
Ji tarîxa ku rapora fîşekan hatibû nivîsandin û vir ve, qaçaxçiyan li hidûd ne xistibû. Li gor mercên ku qereqolê danîbûn, dema ku bekçî li himberî qaçaxçiyan an di parastina gund de fîşek biteqandana, di a din î rojê de mecbûr bû ku digel şahidekî an du şahidan û muxtêr biçûna nig başçawîşê Sitilîlê, rapor nuh bikira. Rapor qewîn bû. Di raporê de pênc pakêt fîşek nivîsîbûn û Remo jî şeş fîşek berdabûn.
»Ez bi tenê du fîşekên vala dibînim. Te çi kir ji herçar fîşekên din?«
Dîsa li gor mercên komutanan, di bêhnika teqînê de şev ba, bahoz ba çi diba bila biba, bekçî mecbûr bû ku fîşekên xwe ên vala bidana ser hev û fîşek wek delîl şanî başçawîşê qereqola Sitilîlê kiribana. Îcar dema ku bekçî ev yeka ha ne kiriba, başçawîş jî bûyer di derbarê firotina fîşekan de
dihesiband; him lê êşkence dikir, him pere jê distendin û him jî ew dixist girtîgehê. Bekçiyê berî Remo Cemîlê hûrî li ser ku çûbû nêçîra betan, sê fîşek berdabûn. Fîşekên vala winda kiribûn û bûyer bi haweyê ku fîşek

berdabûn dizan, bi başçawîş re derew kiribû. Başçawîş jî ew dabû girtin. Cemîl neh meh û sê rojan di girtîgeha Nisêbînê de raza bû.
Remo çar fîşek dabûn windakirin.
»Qomandarê min, şev him wek teniyê reş bû û him ji erd û ezmên berf û baran dibariya û him jî min bi bazdan dabû dû wan teqîn dikir. Ji ber van sebeban ez bi xwe re ne giham ku ez fîşekan bidim hev.«
»Bi rastî tu mirovekî tam qewad î. Helbet di wê şeva reş û tarî û bahozî de, nakeve aqilan ku wê mirov bikarîba fîşekên tivinga ingilîzî ku du, sê
58

metroyan dipengizand, bida ser hev. Yanî niha qaçaxçî ji ber te direviyan ha!«
»Erê erê, qomandarê min. Heta bi qûntara çiyê min da dû wan.«
Bîçer serê xwe ber bi ezmên de rakir, hinekî fikirî. Dûv re berê xwe da muxtêr û got:
»Bedran axa, ma ez ji bekçiyê te bawer bikim? Ma tu bi xwe bawer dikî?«
Muxtar:
»Çiqasî daye dû qaçaxçiyan ez ê wê nizanibim, lê gava ku ez hilk-işiyabûm ser xênî û min li teqîna ser hidûd guhdar dikir, Remo jî wê gavê ji jora gund ber bi mala min de dihat.«
Bîçer madê xwe tirş kir û tifek tê werkir.
»Biceheme! Hûn hemû wilo virek in, hûn tu carî gotina rast ji mirov re nabêjin!..«
Ew hîn wilo diaxivî, Remo:
»Qomandarê min, wilehî wilo bû« got, di cih de gotin birî û guhê xwe bi ser dengê têlsiza ku di destê Hesen Çawîş de bû, ker kir. Çawîş têlsiz da dest Bîçer.

»...Ma em wî binin wir?«
»...Mirî ye sax e?«
»...Werînin!«
Dema ku eskeran li ser hidûd diteqand, Remo xwe berdabû bin berqefên ku lê êşkence didîtin. Berê tivinga xwe xistibû erdê û fîşek teqandibûn. Ji bo ku fîşekên wî ê çelpandî jî winda nebin, tiving di çewalê ervên re derbas kiribû. Çewal her tim di ser tivingê re daliqandîbû. Fîşek ji bo careke din ji xwe re hilanîbûn.
Ji eskerên ku li ser bêndera jora gund nahtorî dikir, yekî bang kir.
»Komutanê min, ma em wan berdin an bînin ba we?«
»Erê wan werînin vir!«
Eskeran du mirovên omerî tev li kerên wan girtibûn. Nesroyê hebîsî li ser gotina Heso, digel jina xwe Şemsê çar meşk dims anîbûn ku li Zorava bi pereyan bifroşin. Wê rojê li vî gundî bibin mêvan û di a din î rojê de herin Nisêbînê, ji xwe re hin alavên malê bikirin.
Bîçer mîna dîkê elokan li dor wan sûrikî, ketûber pehîn li Nesro xistin û darê xwe di meşkan rakir. Berî ku Bîçer biaxive Nesro:
»Begê min, barê me dims e dims« got û kete temenê. Şemsê jî destê xwe dabû ber ruyê xwe û bi haweyekî behetî li wan temaşe dikir.
59
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Xelkê herêmê piçûk - mezin, mîna ku pez ji gur bitirse, wilo ji eskeran ditirsiyan. Her roj ya eskerên Sitilîlê ya jî ên hidûd li gundekî çiyê û deşta Nêsêbînê di ser zikê xelkê de bûn; xelk dişelihandin û êşkence li wan dikirin. Gundî ba bajarî ba, gava zarokên xwe dikirin xew û zarok raneketibana ji zarokan re digotin »Lolo emirquto, emirqutê razên, binere wê esker bên we ha!« Zarok jî bêdeng dibûn û radiketin.

Li vê herêmê selahiyeta eskerekî bêrutbe, bi qasî selahiyeta qiralekî ereb, mezin dihat. Dilê wan çawa dixwest wilo dikirin.
Di gulana sala 1950î de eskerekî Sitilîlê bi sirêçkiyan sê şixre kelbeş çinîbûn. Pêncî, şêst mêr xwas derxistibûn ser bênderên jora gund û bi hemiyan gêra sitiriyan kiribû. Gundiyekî gava eskerek li çolê, li ser rê, li ku derê dîtiba bila bidîta, mecbûr bû dev ji karê xwe berda, kar çi diba bila biba, ji vî eskerî re têketa temenê û emirê ku esker bida, pêk bianiya. Di sala 1968an de çar eskerên qereqola Pîrebokê çil û sê mêrên sarinciyan xistibûn felaqê. Heta di vê felaqê de lingê Eshedê Cino tê şikenandin û seqet dibe. Eskerekî, temamê gundiyan dida dû xwe û gîhayê ber têlên mayinan bi wan diçinî. Ji hindama Darê heta ku digiha Cizîra Botan, her sal di mehên biharê de wek palûtê, gundî sê, çar caran birine gîhaçinînê. Di mehên havînê de jî pûş û pelax bi wan didan hev.
Di 1935–1940î de li Stilîlê wilo merc danîbûn ku gava başçawîşê qereqolê derdiket nav gund, mîna ku darbesta miriyekî di ber mirov re derbas bibe û mirov jî hema wilo yekser rabe ser xwe, çik bisekine û jê re duan bike, gundiyan dev ji karê xwe berdida û jê re diketin temenê. Lê ji ber ku Stilîlê gundekî li dor du hezar malî bû û li vî gundî dezgehên çêkirinê wek nalbendîçitiyê, kurtankirî, darteraşî, sengteraşî û qesirbendiyê hebûn, benê xwe hinekî sist dikin. Qereqol di nav gund de bû. Başçawîş jî heroj pêşenîka xwe şeh dikir û li nav malan digeriya. Kar disekinî û xelkê ji gund bar dikir. Di wan salan de barkirina ji vî gundî, li hesabê komutanan ne dihat. Çimkî Stilîlê dilê omeriyan û bûblaniyan bû. Cihekî rêser bû. Ji bona ku mirov mezinahî li hermê bikira, pêşî divabû mirov şahê Stilîlê ba.
Bîçer çav kir eskeran. Eskerekî bi çepilê Şemsê girt û ew bi nav malan de terqand.
»Tu ji ku derê yî?«

»Ez ji gundê Hebîsê me.«
»Nasnava xwe derxîne ez bibînim!«
Ji roja ku xeta mayinan hatibû danîn li herêmê, bênasnav kesekî ji
60

gundê xwe nikarîbû bi derekê de biçûya. Gera bênasnav qedexe bû. Heta dema şivan û gavananên li çiyê bênasnav bihatana girtin, sûc bû. Sûc jî ji du sed benqenotî dest pê dikir heta ku digiha hezaran. Mirovê cezexwir eger ji herêma bûblanî û omeriyan ba, diçû ber destê başçawîşê qereqola Sitilîlê. Başçawîş ceze lê dibirî. Lê ên nisêbînî gava li cihekî wek Cibiltînê ku navbera wê û Nisêbînê 15 km bû, bênasnav bihata girtin, li polîsxanê pere radizandin.
»Begê min li qisûrê nenere, min cûzdana xwe li mal ji bîr kiriye. Begê min...« Nesro, »Begê min, begê min...« digot û komutên jî herwiha şiqam li ruyê wî dixistin.
»Tu ê nasnava xwe ji bîr bikî ha! Tu ê bêqanûniyan bikî qewad, ha! Ma tu kitim î!« Nesro mirovekî navser bû. Û bi giştî jî navserên vê birekê hinekî jibîrkoyî bûn.
»Na. Lêbelê begê min, wilehî û bilehî min ji bîr kir ku ez hilgirim ser xwe.«
»Qaçaxçiyan tu şandin vir; da ku ji aqûbeta hevalê xwe tiştekî fêm bikin, ne wilo?«
Nesro bi vê gotinê cefilî, qûnaqûna du gavan paş de çû. Dûv re xwe berda ser çongan, ji komutên re çû sicûdê û bi kelûgirî:
»Ez ketim bextê te begê min tu ê min nekujî. Ez bi navê Xwedê û pêx-ember sund dixwim ku hay û bayê min ji tu qaçaxçiyan tune ye...«
Nesro hîn ji serî de ji desthilanîn ketibû. Çar sal berê dîsa barê wî dims e, tê Zorava û bi rê de du eskerên Sitilîlê wî zeft dikin. Esker bila sûc û se-

beb dimsê wî bi erdê de dadikin û bi lêdanê parsuyekî wî dişikînin. Ji ber vê hindê ew tu carî di rêyan re ne dimeşiya, li çolbirê dixist û diçû qonaxa xwe. Lê mixabin feleka wî vê carê jî çewt geriyabû. Ew û jina xwe bi mebesta ku leqayî eskeran nebin, ji Hebîsê di çiyê re heta bi Zorava sirt û sirt, kaş û kaş, newal û newal hatibûn. Rêya ku li dor sê seetan digirt, wan li xwe kiribû pênc seet û nîv. Bi halekî zor xwe gihandibûn gund.
Bîçer lingê xwe ê rastê danî ser pişta wî. Destê xwe da ber ruyê xwe û xwe bi ser enîşkê de berda.
»Îro ne roja dan û sitendinê ye. Mirov di rojên wilo seqemî de ji mala xwe dernakeve. Rast ji min re bibêje pûşt!« got û bi dest û pê û lepan ew da ber hev.
Pir pîs lê dixist. Piştî ku ji dev û bêvila wî xwîn beliqî, êdî di navbera herdu keran de, li ser qerevîzkan da rûniştandin û digel eskerên xwe ve herçar meşkên wî ê dimsê dan ber devê qezetoran. Dims bi ser de pijiqî,
61
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

têkilî xwînê bû û bi erdê ve herikî. Ew jî mîna şikerekê bêdeng rawestiyabû. Destên xwe danîbûn ser serê xwe, serî daqûl kiribû û xwe bi
ser hev de kiribû gilok.
Bi rê de ew û Şemsa xwe ketibûn xeyalan. Belkî ne bi wan xeyalên rengînîbana, di wê qir û şiliyê de wê nikarîba xwe bigihandana gund. Xwe berdabûn nav sûka Nisêbînê û bi dikan dikan geriyabûn. Çûbûn hindurê qijla wêrankirî. Nesro li vir bîst û pênc qurûş dîtibû. Şemsê ji kê-fa, çarpîne xwe li erdê dabû û gotibû »Ez ê vê ribê, ji Kesranê xwe re hemî bidim bi qidamên şekirî.« Li ser daxwaziya Şemsê xwe berdabûn ber pira Eleman. Ji bo ku trênê li ser pirê bibînîn, tam çar seetan li wir

rawestiyabûn. Şemsê wê ji qîza xwe a pêncsalî re şekirê qulqulkî, ji Beşîrê xwe ê heftsalî re nanê sûkê, ji Gulxana xwe a şanzdehsalî re kirasekî qelemsiltanî bikiriya. Nesro bi ken jê re gotibû, »Şemsê eger tu bixwazî, ez dikarim te bibim liqunta Elîebo. Ê ne keçê tu nizanî bê xwarina vê liquntê çiqasî xweş e! Ji kelizê, ji teyib û neyib jî xweştir e! Heft sal berê, di çarê gulanê de seet li duwanzdehê nîvro ez û Girdoyê Reşê em çûn vê liquntê. Bêî ku em navê xwarinê bizanibin, aşçî ji me re xwarinek anî, ecêb ecêb xweş bû, keçê! Hîn jî tahma wê xwarinê di bin zimanê min de ye!« Şemsê jî piştî ku axînek ji kezebê kişandibû, »Kuro Nesro, em û liqunte ha!« gotibû û gotin qulipandibû ser xarên zindoqî. Berdilkê wê ê piçûk Misto, xar jê xwestibûn.
Bîçer ji Nesro re got:
»Rabe ser xwe qewad!..«
Rabû ser xwe, lê çawa rabû! Pêşî xwe avêt lingên komutên, ling maçî kirin; dûv re hişk bi herdu destên wî girt û bêsekin li ser hev dest maçî kirin. Eger komutên pehînek li qesefa sêngê ne xistiba û ew jî serpiştkî ne ketiba, ji şêla wî dida der ku maçîkirin wê hîn pir bidomanda.
Bîçer berê xwe da koma zilaman û dîsa bi qahr:
»Ev kûçik wê mêvanê kîjan kûçikî ji we ba?« got û qelşa hindurê qûna xwe xurand.
Heso:
»Ew mêvanê min e begê min.«
»Mêvanê te ye ha!« got û ber pê de çeng bû.
Heso xwe li ser pêyan ne digirt, herwiha rûniştîbû. Bîçer lingê xwe xist sênga wî dahf da û ji Nesro re got:
»Vî qûnekî di nav dimsê de bide!«
Nesro bêî ku bifikire bi bazdan hat. Bi çepilê Heso girt û ber bi mextela
62

xwe de kişand. Heso jî di vê navê re mîna ku li mizgeftê be, hertişt ji bîr kiribû, bi hewleke mezin laşê xwe ji pîsiyê û rêxê diparast. Mêrên hûrî bin berqefan wek qedemgehê bi kar dianîn. Navbera mextela Nesro û Heso li dor çil gavekî digirt. Bi rastî Nesro bi haweyekî kotî Heso gêr kir. Eger komutên ne gotiba »Kewaşe, bes e bes e, ma qey çavên te li kuştina wî ye,
bi gêrkirina wî a bi lez û bez, belkî Heso bibeheciya jî. Mîna ku terempêl lê bixîne, hewloxwarî û bêdeng li erdê veziliyabû û herwiha zahferan ji dev diherikî.
Dîsa deng bi têlsizê ket. Hîn Bîçer ne axivîbû, hema wilo pê re girîna cemsan ji hêla Menderê bi ser gund de bilind bû. Gundiyan bi carekê ve berê xwe dan wir, ziq li rê nerîn û bêî ku bi xwe agahdar bibin, hêdî hêdî tewiyan. Gava serê cemsan diyar bûn. Ev qerevîzkî rûniştin. Di vê kêlîkê de ji bilî kuştin û malwêrankirinê tiştek ne dihat bîra kesekî ji wan. Herkes ketibû tolaqa canê xwe. Di dilê wan re, »Vê carê dora kê ji me ye?«
derbas dibû. Ji çavên Sebriyê hûrî hêsir digindirîn. Zibêr berî wî giriyabû û bi serikên lêvan gotibû:
»Wey xwelî li serê min be, bi bîst û pênc qurûşan kulmek benîşt dihat. Zarok ewqasî bi dû min de giriyan ku ji Nisêbînê çend cûm benîşt ji wan re bikirim. Lê ji ber vê xesîsiya xwe a mirdalî, ne min cûmek benîşt û ne jî çend şekirên qursikî kirîn...«
Salar di ber xwe de ditewirand:
»Ev teres, îro wê hinekan ji me bikujin. Îcar ev hin xwezîka Heso ya jî Circîs ba...« Lê fikirên Circîs û Heso jî eynî mîna ên Salar bûn. Wan jî ji hev re fala kuştinê vedikir û gorên hev dikolan.
»Gava Heso bikujin, wê malbat bêserî bimîne. Di malbatê de ên ku şû-

na wî dagirin tune ne. Û wê demê jî gund wê bi min bimîne, çawa bixwazim ez ê wilo bikim...«
Heso jî zahferana ku berî niha avêtibû ji bîr kiribû, dims û demûşa bi laşê xwe ve ne didît û digot:
»Xwezîka Circîs kuştiba û di bedêla vê kuştinê de jî bila herdu lingên min heta bi gwîzekê jê kiribana!«
Panzêrek û cemsek li jora berqefan sekinîn. Cemseke din jî qederê kîlo metroyekê hîn ji wan dûr bû. Mirov digot qey şifêrê wê li deverekê aw-iqîbû, bi hesabê ku hema di cih de bigiha wan, xurt diajot. Ji nav tekerên terempêlê ên dawiyê mîna ava xortûma agirvemirînê herî dipijiqî; herî bi hewa de bilind dibû, wek dolaba êş li hev dizivirî û bi lez dihat xwarê. Panzêr li pêşiya cemsê hinekî dûr sekinî. Ji heriya bi derdora panzêrê ve

mirov tê derdixist ku panzêr, li gelek gundên herêmê geriyaye. Eskeran xwe berî teymen ji cemsê avêtin. Li wê navê rêz girtin û ketin temenê. Teymen bi avêtina ku xwe ji terempêlê avêt, bi yek tûşê hat nig Bîçer. Bîçer jî, bi giraniya temamê kelaxê xwe û bi qahr got:
»Bênamûs lawê bênamûsan! Min di dê û jina te ku...o, te bi çi cesaretê ew lawê qahpikê xistiye wê terempêlê, hi!..« û bi şiqaman dabelişî ser.
»Lêbelê komutanê min, komutanê min...«
»Zû zû, wî termî bi dawiya panzêrê ve girêdin û li van herdu, sê gundan bigerînin!« Bi destê xwe Menderê, Sirêçkê û Sarincê işaret dikir. Di vê navê re jî kûçikên ku li nav rez girêdayîbûn, mîna ku ji halê xwe of kirib-in, hemû bi hev re bêyefş direyan. Bîçer bi pêxêla xwe girt çirand û qîj da:
»Aaaax! eskerrr! Çend dest fîşek di ser wan kûçikan re berdin, ez teqiyam! Ez çiriyam! Hiii! Ooff!«

Çar eskeran digel hev berê G3ên xwe bi rajorî gund vekirin û li ser rez girêdan. Eskeran bîst û heft gule bi ser kûçikan de barandin, lê qet tu tesîr ne kir. Bi vê teqînê re kermkerm bi kûçikan ket, hin kûçik zûriyan û hin jê jî bi haweyê ku êrîşî ser mirov bikin reyan.
»Serokê kûçikan dahbe Hûtooo! Bi lez û bez here wan kûçikan haş bike!« komutan got, zikê xwe bel kir û kulîmeka xwe a çepê xurand. Piştî ku çîmên xwe ji hev vekirin, hinekî xwe bi ser kabokan de tewand û bi nav şeqan lîst, dîsa got:
»Esker, çend dest fîşekên din berdin wan! Min di gilika vî gundî ku...ayo!« û li meşa Hûto temaşe kir.
Eskeran mîna ku komutanê wan dixwaze Hûto bireve û ew jî ji vê reva wî zewqê bistîne, di ser serê Hûto re gule firandin. Bi dengê teqînê re pêl li Hûto ket, qîr li ser qîrê da û wek babîsokê çû. Çû lê çawa çû! Berê xwe da rohilat, li nav avzêla erdê nêzîkî gund xist û ber bi gundê Dêrê de re-viya. Komutan jî ji kenan lal bûbû. Li kabên xwe dixist û bi hîre hîr dig-ot:
»Ji xwe re li qevzên wî binerin aman ya rebî! Tu dibêjî qey qedenek baz-dide!..«
Bi rastî jî qevzên ku wî diavêtin, mirov bi hêsanî dikarîbû bi qevzên hespekî kihêl qiyas bikira. Ezmên di nav şeqên wî re xuya dikir. Gava dabû nav avzêlê û bazdida, ji av û heriya ku bi dû xwe de rakiribû, teba bû, insan bû çi direviya mirov tê dernedixist.
Peşkên baranê tên. Ewrên reş û tarî çiya rapêçane, beledî vedidin. Ji ewran çiya reş vedaye. Gire gira tavan tirs û sawêrê dide. Şewq ji ezmên
64

diçe, birûsk li tahtan dikeve agir ji tahtan bilind dibe. Û Zarok jî qîjan didin. Ew difikirin ku ev dengê çapiliyên eskeran e û bi bavê wan de dite-

qînin. Aha bêhneke din wê ev »Çapilî bi min de jî biteqe, hewarê yadê!« Gundî hemû behetî ne! Ziq li termê ku bêhnika din eskeran ji terempêlê avêtibûn erdê, temaşe dikin. Term digel ku bi derbên qezetoran hatibû terişandin, dîsa jî ewqasî ne bi xwîn e. Zikê wî ne qelaştine, lê serê wî bi carekê ve pelixandine. Herdu kortikên çavên wî hatine xerimandin, guh û bêvil û sitir û gunên wî jê kirine. Eger ne ji şana ruyê Hisoyê licî ba, mirov wê nizanîba ku ev termê wî ye.
Hiso li hindama goristana Zorava ji serma ta girtibû, dirikrikî. Wek hevalên xwe hemiyan ew jî li ser bêr siwar hatibû. Ji goristanê hinekî bi jor de li texma Kunheftarê piştî ku dibêje »Ez diqefilim, ez nema xwe li xwe digirim«, çend deqîqe nakevin wê navê, bi ser bêr de dikumişe û nema deng jê tê. Xalûqê qubalî bi benekî naylonî ew li ser hespê girêdabû. Qapûtê xwe bi ser dadike û bi lez berê xwe didin şikeftên dorhêla Qûzo û Gurik. Xwe ji ser bestê dadigerînin, li çolbirê dixînin û didin sirtê. Dema ku karwan digihê şewlên dor gund, Hiso bêî ku kêferatê bike, hinekî dilebite. Karwan li ser daxawaziya Xalûq, Hiso li şikefteke Zivinga bi tû, datînin. Şikeft pir mezin bû. Gurikiyan di demên berê de, li dor pênc sed pezî di vê şikeftê de bi cih dikirin. Şikeft ne paqij bû, lê germ bû. Dilopan, zibilê salan bi ser hev de dewisandibû, kiribû dirg. Û karwên jî li ser van dirgan ji Hiso re agir kiribû. Hiso bi pîvana pênc gavên Xalûq ji êgir dûr vedizilînin. Piştî ku barê hespê wî datînin, hespê girênadin, hesp û bêr û Hiso di wê rewşê de dihêlin û bi lez ber bi Qubala de dimeşin. Lê mixabin karwan hîn du mişar rê navêje, Hisoyê bêkes û kûs di bin giraniya reşaya şevê de can dide.
Îcar eger ne ji hespê Hiso ba, belkî esker danegeriyana vê şikeftê û ew ecêba mezin bi vî termê ku reş û şîn vedaye, ne hatiba! Hespê, xwediyê xwe dabû dest. Eskeran hesp ji dûr ve dîtibûn û rasterê xwe lê girtibûn. Hesp ji ber wan ne reviyabû. Qefilek esker gava term kişandibûn ser

tahtê û bi keviran serî dipelixandin, qefila din jî hesp dabû ber devê qezetoran.
Term li ser piştê bêsitar, şilfîtazî li wê navê avêtiye. Hiso hinekî dirêj û zehîf xuya dike. Sênga wî mîna ku tu postê karekî bigirî ser, hemû bi pirç e. Ji pirça wî a wek qîrê reş, mirov tê derdixîne ku Hiso hîn ciwan e. Sih sal derbas ne kiriye. Sê, çar qezetore li kortika qirikê xistine, zengelork di bin çenê de xwe daye ser hev, mîna hincasekê bel bûye. Herdu ferşên çon-

gan ji çerm bûne, ferş zere xuya dikin. Di şûna hev de belkî çil qezetore li kêleka wî a çepê dane. Devê birînan fireh vebûne. Bi rastî kambaxî berdane laşê wî, tu nikarî nas bikî bê kî ye ev ê ku termê wî kirine sembola qebhetê.
Bîçer piştî ku erza teymen, li ser ku çima term bi pey terempêlê ve girênedabû û term ji dehma Gurik heta Zorava bi erdê re ne xirxirandibû, şikenand. Pêşî xwest ku hema yekser term bi dû terempêlê ve girêde û li nav gund bigerîne. Lêbelê dûv re gotin guhert, »Wî wilo bihêlin!« got û bi aliyê term de meşiya. Lingê xwe ê rastê li ser defê sênga Hiso gerand û bi serpozka potînê birînên wî tev dan. Serpozk hinekî bi xwîn bû. Wî potîn di erdê da. Dûv re pê li sêngê kir, destekî xwe li ser kabê û ê din jî di kêlekê de danî. Qeweta kelaxê xwe hemû berda ser û qêriya:
»Pêzevengino bibin rêz! Yek bi yek werin li vî lawê qahpê binerin bê kî ye?«
Mele Salar ji cihê xwe qevizî, Sadiq da dû. Mele li ber term sekinî. Bîçer li çavên mele nerî.

»Wek ku çavên te şil xuya dikin, tu digirî ha! Qey tu dixwazî ez wek wî li te jî bikim!« got û heta jê hat kulmek avête devê wî.
Mele teqlekê bi ser hev de qulipî. Lêbelê li yek tuşê jî rabû ser xwe û bi dengekî melûl:
»Begê min, wilehilezîm ez vî mirovî nas nakim.«
»Lawê bênamûsan, te lê temaşe ne kir heta ku tu wî nas bikî! Li nav şeqên wî binere, belkî ji sitir û gunan tu wî nas bikî!..«
Gotinên wî dilê Salar perçe kiribû. Difikirî.
»Ma li himber vî zalimî ez dikarim çi bikim ya rebî! Ji vî mexlûqê ku termê miriyekî tîş tîş kiriye, ez ê çi bibêjim ax hewar! Ey xwedayê mezin, te ev ebdê xwe ê jar û hejar, ji bo ku çar qurûş pere qezenc bikira û kufletê xwe bi salê xista, qerisandiye û tu bi destê ebdekî xwe î din toran tê de dikî! Eger te qaçax bi vî ebdî şêrîn ne kiriba, ev ibret jî ne dihat serê wî! Îcar hinekî rehmê biavêje dilê vî zalimî ku xwe ji ser vî kelaxê tar û markirî bide alî!..«
Mele xwe daqûl kiribû û qîq li nav şeqên wî dinerî. Piştî ku kêlîkekê dirêj wilo daqûlkirî ma:
»Begê min, bi bilah û bi tilah min ew nas ne kir!« got û bi lez meşiya.
Circîs di nîvê rêzê de mîna ku ne dixwest kesek wî bibîne, ketibû talda Ridwên. Dirikrikî. Bi zor xwe li ser pêyan radigirt. Heso dabû dû Sêdiq
66

li erdê dinerî û xwe diquriçand. Dîsa paxafê girtibû dilê wî. Bi van qurîncekan dixwest canê xwe hinekî şiyar bike ku bikaribe xwe li tena bigire û komutên bibersivîne. Heso gava ku tirs û sawêr pê re çêdibû, her tim xwe diquriçand. Ev haweyê wî, di gelek caran de saw ji ser revandibû û ew bi cesaret kiribû. Lêbelê di vê carê de ev hawe qelp derketibû. Bi çer-

mê laşê xwe digirt badida û hey badida, lê canê wî bi xwe şiyar ne dibû. Nenûkên xwe di çerm de diçikilandin û nenûk digihandin hev, lê dîsa jî mihf ne dikir. Xwe bi xwe digot, »Qey ez saxekî ji miriya me! Belkî jî ez mirî me, ez bi xwe nizanim...« û dev lêva xwe dikir. Lêv ji zû de ziwa bûbûn, xwînê lêv şil ne dikir. Hişk bi zimanê xwe girt, ziman kişiya û wî dev qurmê zimên kir. Rimekê bilind bû û bi ser komutên de pengizî. »Ecelê neke Heso efendî, sebrê bike, wê dor bigihê te«, komutan got û pehînek di zikê Sadiq werkir. Qêrîn bi Sadiq ket, bi zikê xwe girt û devê xwe xiste erdê. Di wê navê re jî eskerekî li Bedrên dixist; çima ku rûniştibû.

Bîçer li dor term çû û hat û zîvirî. Ling da bin term, serzik qulipand. Pê li tilmiqûnan kir. Xwest ku wan bilewliqîne. Lêbelê tilmiqûn jî mîna temamê kelêx ji sermê bûbûn çekur, ne lewliqîn. Tif kir. Tif bi ser term de belawela hat xwarê. Kupkup bi devê wî ket, mîna ku avê di devê xwe de werde tif da ser hev, bi hêrs dîsa tif kir ser term û berê xwe da Heso. »Tam li qula qûnê binere!..«

Heso çend kêlîk berê hebitî bû, lê ne bi qasî di vê kêlîka niha de. Rengê wî bi carekê ve zer qulipî. Çavên wî mîna du tasan vebûn, bêlept sekinî û beloq nerî. Gotinên bavê di bîrê de hatin. Bavê jê re gotibû »Lawê min heta bi miriyên xwe jî di destê eskerên romê de nehêlin, di miriyan de dar

dikutin. Min bi çavên serê xwe dît.

Dema ku Eliyê Betê bi destê eskeran hat kuştin û hevêrkî ji desthilanîn ketin, eskeran jî serê hin fêrisên wan jê kirin û dar radan wan!« Lêbelê wî ji bavê xwe bawer ne kiribû; »Yabo min digot qey tu derewan dikî, ewqasî jî nabe!..«

Heso gava ku diket tengayê, gelek caran jibîrkoyî dibû û xwe belav dikir. Li gundê Cizîrê Yekmala, li Qesrikê, li Serêkaniyê, li Darê û heta li

gundê Heso bi xwe di destava termê Temer de dar kutabûn.
»Hiii çawa bû kerxaneçî? Te pir lê temaşe kir. De ka bibêje bê ev qûna kîjan qûnekî ye?..«
Mîna yekî di xew de ku tu bi dêr wî şiyar bikî:
»Haa!« got û wek dînan tevxircilî.
67
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Bêşeref ez ji te re dibêjim ev kî ye? Tu wî nas dikî zû ji min re bibêje!«
Heso ew nas ne dikir. Belkî di temamê jiyana xwe de ev mirovê ji hevqeliştî qet ne dîtibû. Lêbelê komutan wek wî ne difikirî, xwe bi ser de kil kir:
»Qaçaxçiyê ku bikaribe di vî gundî re derbas bibe, miheqeq wê hin jî dostê wî hebin. Ev hin kî ne zû bibêje!..«
Argûşkên Heso li hev siwar bûbûn. Gava diaxivî kufînî ji dev dihat, bêje ji hev belav dibûn, tîp tazî digindirîn. Komutên jê fêm ne dikir. Bi herdu destan weş lê xist û got:
»Devê te şahidê te ye. Temam, min fêm kir ku tu wî nas dikî...«
Heso bêkeys deverû çû erdê. Tibabekî wilo ma. dûv re xwe da ser hev, bi qûnkişkê xwe gihand Casim û nema tevgeriya.
Gundiyan yek bi yek li term nerîn. Komutên him asaq di term û him jî di wan hemiyan de kir. Lêbelê gundî vê carê bi cesaret derketibûn, kesekî xwe li tiştekî ne kir xwedî. Di hin rojên wiha de hin wek Etman û Hesenê hûrî car caran, bêî ku hay û bayê wan ji qaçaxçiyan hebin an hin qaçaxçiyên kuştî nas bikin, bi asaqan xwe xistine bin telpê û derew li xwe kirine. Di sala 1959an de komutanê hidûd Atîlla, Etman û Hesenê hûrî bi mebesta ku qereqola hidûd şelihandibûn, xistibûn sintaqê. Bi êşkencê ewraq bi wan dabû îmzekirin û ew rêyî dadgehê kiribûn. Dadgehê

yanzdeh sal ceze dabû wan. Li gor ku qaçaxçiyê navdar Hemoyê Hisê digot, Atîlla qereqol şelihandibû. Barê pênc, şeş qantiran çek û cebilxane û ewqas jî fîşek firotibûn wî û liciyan. Etman û Hesen şikiriya xwe anîbûn û gotibûn, »Mala Xwedê ava ku bi yanzdeh sal ceze bû, lê ne bi kuştina me û şewitandina gund bû!« Lê ji bilî Heso, Circîs, Kenêr û Salar kesî bîr ne biribû ku di vê bûyerê de, kuştin û şewitandina gund, wê bi kêrî yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê usteymenê hidûd ne hatiba.
Hesen Çawîş û du eskeran xwest ku termê Hiso ji destan girêdin. Lê Bîçer li himber vê rabestina wan derket. Term ji lingan girêdan û bi dû panzêrê ve kirin. Panzêrê hereket kir û berê xwe da taxa jor. Pîrekên ku li
ber deriyê hewşan li hev kom bûbûn, reviyan hinduran. Paceyên odan girtin û xwe li zarokan pêçan. Panzêr li dor gund zîvirî û dîsa hat li cihê ku jê hereket kiribû rawestiya. Term ji ser piştê qulipî bû ser dev. Serê Hiso felqe felqe pejilî bû. Ji heriyê mejî, goşt, hestî û porê wî ji hev ne di-hate fesilandin.
Bîçer piştî ku ji ê şifêr re got:
»Carekê jî di nav malan re here û were«, dîsa rahişte dêr. Darê xwe mî-
68

na şûrê qetilê avêt wî, ê din û bi qahr axivî:
»Heçê ji we de qaçaxê neke diya wî jina wî be! Qaçaxê bikin, bikin!..«
Kesekî gotinên wî lê venegerandin. Ji bilî Heso û Osmanê yextiyar herkes li ser pêyan rawestiyabû, serê xwe xistibû ber xwe û bi mitale di-fikirîn.
Seet yekê nîvro ye. Bîçer li pêpîkê xist, esker hemû li dor wî kom bûn.
»Zû xwe bidin ser hev ku em bi rê kevin« got û ber bi Circîs de çû.
Di vê bêhnikê de jî dîkekî sipî î şamî dabû dû mirîşkekê. Bi qîje qîj û

tuxe tux hevdu li dor qesirê digerandin. Dîk tu eman ne dida mirîşkê, xwe ji ser venedikişand. Mirîşkê bêmefer xwe li nav koma gundiyan xist, melisî û dîk bazda ser ku bifisikînê. Bîçer bi xwe ne xweş anî:
»Lawê min, wî dîkî bigurînin!« got û bang Mîrzoyê mitirb kir.
»Reyisê dîk û mirîşkan Mîrzo, were vir!«
Mîrzo ji cihê ku lê sekinîbû bazda û bi haweyekî mitirbî:
»Emir bike qomandarê min ê herî mezin!«
»Vê mirîşkê çima xwe avêt nav koma me û xwe li ber dîk melisand? Dîk çima wilo di nav me de fisikand vê mirîşkê?«
Mîrzo xwe bi ser hev de qurmiçand û bi haweyekî melûl:
»Ma ez çi dizanim qomandarê min ê mezin.«
»Bi bazdanê here mirîşkên xwe bîne vir û ji wan re li ribabê bixe!«
Mîrzo, gava çîçik nuh ji hêkê derdiketin, çîçik dixistin hindurê sêlê, sêl bi agirekî hûr hêdî hedî germ dikir û ji çîçikan re li ribabê dixist. Bi vî haweyî çîçik mezin dikirin. Refek dîk û mirîşkên wî hebûn û hemû jî re-qisvanî bûn. Dema ku Mîrzo li ribabê dixist û wan jî dengê ribaba wî dikir, dev ji êm berdidan û di cihê xwe de habela diperpitîn. Dîkekî wî î qoqo, bi rastî jî tam heqê reqsê didayê. Gava ku Mîrzo ew hemû li gasînê kom dikirin û ji wan re lê dixist, vî dîkî sergovendî dikir, baskên xwe ji hev vedikirin, xwe dilewliqand û ji vî serî diçû seriyê din.
Mîrzo bi sê mirîşkan, dîkekî û ribaba xwe hat. Çûn û hatina wî hemû deh deqîqe ne girtibû.
»Qomandarê min ji bo ku mirîşk bireqisin, divê ku ez bi zimanê wan bistirêm. Ew ji tirkî fêm nakin.«
»Temam, bi zimanê wan bistirê!«
Destên Mîrzo ji lêdanê werimî bûn, bi zor ribab digirt. Zîqînî bi ribabê xist, mirîşk çeng bûn û wî bi kurdî da ber hev:
»Giriyê min bi aqilê me tê

69
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Kenê min bi halê me tê
Mirîşkino zelqa we tê
Gidî bigirin dawetê
Eman eman eman...«
Bîçer û eskerên xwe ji ken lal bûn û li erdê veziliyan. Mirzo gerek zêdî deh deqîqeyan li ribabê ne xistiba. Lê li ser emirê komutan, heta ku mirîşkên wi ji taqet ketin û di cihê xwe de melisîn, lê xist.
Bîçer Circîs xewle kir û bi aliyê berqefan de meşiyan. Bi haweyekî dev-liken:
»Circîs efendî...«
Xwîn bi Circîs ve hat, ruyê wî mîna gulekê vebû. Xwe li bendî gotina dûv re ne girt, bi kêf û eşq got:
»Bibêje begê min bibêje« û ziq li devê wî temaşe kir.
Bîçer destê xwe di ser serê wî re bir û anî û firkand. Bi haweyê ku bikene zor da xwe. Devê wî mîna qayişa patozê veziliya, bi tenê serikê diranan di-
yar kirin û bi xweş û bêş:
»Circîs efendî, ev Heso çima ewqasî dijminê te û kinêsa te ye? Wê rojê dîsa zilamekî xwe, vê carê jî bi sebeba ku ez qesabiya qereqolê ji zilamê te
bistînim, şandibû nig Hesen Çawîş. Lê ji ber ku dilê min her tim ji te re dixawze, min zilamê Heso qewitand...«
»Begê min dûrî te, dûrî te, dûrî te, Heso mirovekî teşqelker, pêxwas, fe-sad û şerxwaz e...«
»Bihêle ez peyva xwe biqedînim!«

Circîs hinekî cefilî, xwe paş de vekişand û kete temenê.
»Begê min bibexişîne, devê min bişike, ma qey min li himber begê xwe qisûrek kir?«
»Çend roj berê jî îcar Heso hate nig min û got: 'Circîs dan û sitendinê bi qaçaxçiyan re dike.' Lê min bi xwe bawer ne kir. Û ez naxwazim jî bawer bikim. Heşkere ji te re dibêjim ku ez ji Heso dihenitînim. Mirovekî pir qure û zimandirêj e. Eger rojekê ez bibihîzim ku zilamên wî di gund de xirecirê derxînin, ê ne bavê wî melkemot be jî dîsa ew ê ji nav lepên min xelas nebe, ez ê bihêlim ku başçawîşê Sitilîlê wî bi lêdanê tirek bike. Û heta belkî ez wî rêyî girtîgehê jî bikim.«
Circîs pir dixwest ku Bîçer herwiha di biwara Heso de biaxive; rêya bersivê bide wî û ew jî şelafiyan jê re bike. Lê Bîçer jî mîna ku wî zarok bibîne, bi herdu destan ruyê wî hinekî firkand û bi lez hat ba eskerên xwe.
70

Li terempêlê siwar bû, serê xwe di pacê re derxist, »Ez di dê û jinê we hemiyan ku..im û bi xatirê we!« got û terempêlan hereket kir. Ew li cemsa pêşî siwar hatibû. Panzêrê dabû dû cemsan. Termê Hiso jî mîna beretekî bi dû panzêrê ve bû û ber bi Menderê de sûrikîn.
***
Terempêl gihabûn gundê Menderê. Lêbelê zoravî ji tirsa Bîçer hîn jî wilo bêdeng, di temenê de rawestiyabûn. Eger ne ji qelebalixa pîrekan, orandina dewêr û ewte ewta kûçikan ba, kî dizane, ev bêdengî belkî tibabekî dirêj hîn jî dom bikira. Lê pîrek ji mêrên xwe wêrektir derketibûn. Bêdengiya mêran zû xerab kirin. Li bendî wan nesekinîn; dewar û pezên xwe bi çolê de rast kirin û xwe berdan ser bênderan. Teqil û pêl li zilaman ket. Dijmin û dijmin digel hev rêz girtibûn. Yek bi yek ji ber

hev ketin, heryek ber bi hevalê xwe de pekiya û xwe li dera ha dan ser hev.
Du komên dijmin ji hev cida rûniştin û bi ser êşa birînên xwe de tewiyan. Çar, pênc seetan lêdan xwaribûn û li ser pêyan rawestiyabûn. Eger Bîçer ji gund nedaba rê û herwiha asaq û tore di wan de kiriba, van mirovan belkî pênc seetên din heta belkî deh, panzdeh seetên din jî bi wî haweyî bikarîba xwe li ser lingan ragirtiba. Piştî ku bawerî anîn êdî Bîçer nema li wan vedigere, bi êşa canê xwe şiyar bûn û li ser wê şil û pilê bêhemd xwe ramidandin. Piçûk û mezin temamê gund bi ser bênderan de kişiyan. Qefile bi qefile dihatin. Lê Sarê di nav wan de xuya ne dikir. Meyro dabû pêşiya qefilê û bêhnçikyayî dihat. Dergûş li malê avêtibû. Xawas, servekirî û bi tena kirês bû. Hûçikên wê ên berdayî bi erdê ve dikişiyan. Pêxêla wê vekirîbû. Memikên wê ên girover di şîr de zewirîbûn, serikê memikan mîna du guhîjan di bin kirês de bel bûbûn. Wê nizanîbû ku bi wî haweyê xwe, pê li adetên civakê kiriye û meydan ji zilaman re xwendiye. Ji herkesî bêtir ew tirsiyabû. »Min kuştina bavê xwe dît, ez naxwazim kuştina Temo jî bibînim«, digot. Li gor tore û edetan şerm bû gava ku pîrekê di nav koma zilaman de, mêre xwe maçî kiriba. Lê Meyroyê, mîna ku ne di nav kevneposiyên islamê de mezin bûbû, li pêş wêqas komê, çepilên xwe li gewriya Temo gerandibûn û ew maçî dikir. Temo jî ew dahf dida û bi hêrs jê re digo »Keçê, xwe ji ser min bide alî, şerm e! Li himber bavê min tu çawa dikarî min maçî bikî!..« Lê pir jî dixwest ku devê wê ji ruyê wî, heta ji temamê laşê wî derneketa. Di nav livînan de ji bo ku Meyro xwe lê bipêça û nehişî pê re têketa têkiliyê, can dida. Gelek pîrekên din jî mîna Meyroyê kiribû. Pîrekan mûlit kiribûn

setqe ku mêr dîsa bi saxî li wan vegeriyana. Jina Cemşîtê şivan kurka ku hîn di ser hêkan de bû kiribû setqe. Cemşît bi qahr ji jina xwe re digot »Keçê Helê, ma mirov kurkê dike setqe!« Helîmê jî jê re digot »Ma ji mirîşkekê pê ve çî me hebû Cemşîtko! De îcar şikiriya xwe bi rebê banî bîne ku tu da xatirê wê mirîşkê. Eger min kurk ne kiriba setqa te, bi saxî tu ê çawa li min vegeriya!«

Bîçer û eskerên xwe zoravî êşandibûn. Canê wan bi lêdanê kiribûn wek rêsî. Parsû û serê hinekan şikenandibûn. Ling û destên wan bi daran ter-işandibûn. Hin jê xwîn vedirşiyan. Lê dîsa jî ev lêdana ha li gor lêdanên berê, ne tiştek bû. Zoraviyan qezenç kiribû. Kesek ji wan ne hatibû kuştin. Hebûn, hema çiqasî bi merez û êş û cefa ba, dîsa jî ji nebûnê çêtir bû. Herkesî şikiriya xwe dianî û digot »Mala wî ava ku kesek ji me bi dû terempêlan ve girêneda! Kesek ji me bi rêya nexweşxana Mêrdînê de neşand! Kesek ji me ne kuşt! Mala wî hezar hezar carî ava be ku pîra Sarê ne kuşt!..«

Li vê herêmê mirovê gava ku di sinhetê xwe de dibû pispor, civatê leqabek lê dikir. Navê Îsa, Mûsa, Mihemed, Ebû Sufyan, Tecal, Şeytan, Cibraîl, Îzraîl û hwd. hema hema li her gundî hebû. Li Zorava jî ji Sadiq re »Îsa«, ji Kenêr re«, Şeytan«, ji Xelef re »Bahlûl«, ji Zibêr re »Ebû Sufyan« digotin.

Heso ji hawhaw ketibû. Nikarîbû raba ser xwe. Lingê wî ê tehenî ji fe-laqê, mîna balonekê nepixîbû. Ling diariya. Dema ling dilebitand, tevzînok bi ling vê hildikişiyan agir bi kezeba wî diket. Bi pişta xwe girt-ibû û xwe bi ser hev de diguvaşt. Ji pehînên Bîçer canê wî birîn bûbû. Temo ew li ser pişta xwe kiribû û anîbû malê. Sarê ketibû ber pişta wî û melhema çavan di piştê de dida.

Bi berger:

»Heso laşê te xerab bûye, ka em te bibin Mêrdînê nig textor.«

Wî bi hinc destê Sarê ji ser pişta xwe heliqand:
»Textorê min di gund de ye, xwîna wî melhema birînên min e!«
Sarê qesda gotina wî fêm dikir. Lê ne dixwest ku cirê pê re bikişîne û têkeve gewriya wî. Hinekî fikirî. Xuya dikir ku hêl dida gotinên bijarte; bi van gotinan mêrê xwe nerm bike, da ku felaketeke ji a berî niha mezintir bi serê wan de neyê.
»Zarokên xelkê ji dengê tivingên eskeran hebitîne, bêhna xwe fireh bike ez bi heyran...«
»Bila ew birayê te ê kafir jî wilo bifikire! Erê keçê, ev niha tu çima hat
72

nav wan eskeran! Eger min ew derew bi wî teresî re ne kiriba niha tu kuştîbû! Ez hîn jî difikirim bê ew gotinên wilo çawa hatin bîra min!«
Sarê bi hesabê ku dilê wî xweş bike.
»Erê pîro, ma çima qey tu hindik î! Bi Xaliq tu îro tam zilam bû. Him bi aqilê xwe û him jî bi mêraniya xwe, tu gula komê bû.«
»Tew, bê çi guleke xweşik bû mêro. Tereso qûna me çilvirand, gû û mû da me û tu jî çêlî gulan ji min re dikî! Bi rastî ev jin, ev jin şeytanê mêr e! Gava dilê wê bixwaze, dikare mêr bi qasî Rûto mezin û bi qasî Şûto jî piçûk bike! Bê kê bîra gulê dibir kuro!..«
Ew hîn wilo diaxivî, Hemo gava xwe avête hindur:
»Apê Heso Xwedê xêr bike, mesele çi ye? Ji bo çi te şandibû dû min?« got û di pêşberî wî de çarmêrkî rûnişt.
»Xwedê xêr neke! Em nikarin vê tirê ji mala hûran re bihêlin. Têhildan di nav me de ji bav û kalan de tiştekî şerm bû. Lê van teresan ev bêşerefiya ha kir sêr û li me rast kirin. Carekê derew, du caran derew, sê caran derew her ku qomandarê hidûd bi eskerên xwe ve digire ser gund, vê gotinê dibêje.«

Hemo piştî ku keserek kişand, destê xwe avêt bêrîka qêpût, ji bêrîkê qutiya tûtinê derxist. Qutî mezin bû. Kenarekî wê zingar girtibû. Serê xwe bi ser qutiyê de tewand û di ber xwe de:
»Kîjan gotinê dibêje?«
Heso ji cihê xwe qevizî û mîna gindorekî bi ser çementoyê de herikî. Xwe qulipand ser kêleka çepê û bi zirt peyivî:
»Tu çima xwe ehmeqşeytanî dikî Hemo! Ma te ne dît bê Hesen Çawîş ji te re çi digot!«
»Bêhna xwe fireh bike apo«, balîf ji ber pişta xwe da alî û destê xwe avêt çeqmêq.
Temo rê nedayê, ji cihê xwe çeng bû û bi hirmet çeqmaq li ber pêxist. Çixare qalind pêçabû. Ji aliyê qûnikê ve pêxist. Dixana çixara wî mîna badokê, zirav li hev zîvirî û ber bi beştan de bilind bû.
»Apê Heso ez jî wek te difikirim. Îdrîs fesad e; bi fesadiyê mû ji bavê xwe bernedaye. Ez bawer dikim ku biwara me li cem Hesen Çawîş an û qomandarê wî kiriye.«
Temo berî bavê xwe:
»Rast e, Îdrîs mirovekî vîlikî ye. Serkêşê vîlikgerê hûran Îdrîs e. Eger wî gotineke wilo bi çawîş re ne kiriba, çawîş ji nav wêqas komê bi qirika wî ne
digirt. Çawîş genitiya wî ji tiliya xwe bêhn ne kiribû. Çawîş rast dibêje.«
73
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Heso ji nişkê ve gotin guhert:
»Ka ew rebenê Nesro li ku ye?«
Meyro:
»Apo çû mala xwe.«

»Ma wê çima nere mala xwe caminê, em di şerê top û tenq û teyaran de ne. Erê kuro niha hûn bi qedirê Mishefa Reş kin, ma çi hewcedarî pê heye ku ev xelk bi cûzdan û mizdanan li van gundik û mindikan ji xwe re bigerin, hi! Kî ji me çi bike ew pê dizanin. Me yek bi yek nas dikin. Navên me hemû li ba wan qeyd kiriye. Çend qulên teban û şikeft di van qelaç û çiyayikên me de hene, bi hemiyan dizanin. Tobe estexfîrulah, erê niha ku di navbera Tirkî û Sûriyê de, û ya jî di navbera me û van dêqereqahpên eskeran de şer hebûya, dîsa xem ne dikir lo, bila li ser me bigeriyana. Dibê de were û kirasê xwe neçirîne! Bêşerefên qomandarên hidûd, tabûra Nisêbînê û başçawîşê qereqolê lingên me xistine zikê me oof! Bûne şahên me şahên me!..«

Sarê pala xwe dabû dîwêr, li wan dinerî û kûr kûr difikirî. Gotinên mêr û lêw kezeba wê peritandibû. Ditirsiya. Xwe di halekî heyirî de didît. Di mala wê de û li pêş çavên wê mêr û law, şêwira lêdan û kuştina bira û merivên wê digerandin. Lê mixabin nikarîbû du gotinên xêrê bi wan re bikira. Bawer ne dikir ku Îdrîs muxbirî kiriye. Çimkî birayê xwe baş nas dikir, dizanîbû ku di terbiya wî de cihê muxbiriyê tune bû. Lê wê çawa bikarîba ev yeka ha ji wan re bipeyitanda? Wê bi kîjan gotinan bikarîba dinyaya Heso a reş û tarî ronahî bikira? Li gor wê ew mirovekî zikreş, bêûjdan û serxweçûyî bû. Wî bi ûjdanê xwe ê qirêj, dilê wê ê paqij dile-witand. Nava wê dikeliya dixwest bigirî, lê girî layiqî xwe ne didît. Destê xwe dabû ber ruyê xwe û bi haweyê ku Heso bi êşa dil û kezeba xwe agah-dar bike, dil û kezeba Heso li gwîzên xîne, melûl melûl lê temaşe dikir. Li vî tewî bav û law e û li wî tewî jî dîsa bav û law e. Ên bi wan re jî hemû xwediyên wê ne. Bêhneke din wê xwe berdana gasînên gund û mîna teyran di hev re bifiriyana. Dê çawa bikira vê pîra perşikestî? Giriyê wê dê

çawa têra hemiyan bikira! Gelo ew dilê wê ê ku bi qasî dilê teyrikekî piçûk

bûbû, dê çawa bikarîba xwe li ber wê êşa mezin bigirta! Di vê bêhnikê de pir dixwest ku Mele Salar li vir ba. Di dilê xwe de ditewirand, »Belkî wî bikarîba ev zilamên xafil ku ji hîsên insanetiyê hatine dawişandin, hinekî hedayet kiriba...« Dixwest qasidekî bişîne dû melê. Û dîsa li Heso dinerî. Heso mîna hûtekî heft serî di devê derî de didît. Qasid kî diba bila biba, ew ê di bin xezeba vî hûtî de bipelixiya.
74

»Temo zû gazî birayên xwe bike; bila herkes li vir bicive; da ku em û van teresbavên hûran çend kaban biavêjin hev!«
Sarê bêhemd ji cihê xwe qevizî. Li ber Heso sekinî, xwe bi ser de daqûl kir û bi herdu destan:
»Hey Xwedê topek li ser dilê te û dûv re jî li ser dilê Circîs xisto! Ev hûn doza çi li alemê dikin, we çi xwe raçavî hev kiriye! Ji vê rîha xwe a sipî fedî bike! Ma ne tu limêj dikî, hey Xwedê limêj qebûl nekiro! Mûyekî reş di laşê te de nemaye, ji pirça laşê xwe ê sipî fedî bike, hey malviritiyo! Ji mirina te re tirek û fisek maye, li zarokên xwe bifikire, hey ne misilman! Tiştê bû çû, çû«
Ji peşkên tifa devê Sarê, serê Heso ê keçel şil bûbû. Gotinên jina wî pê ne xweş hatibûn. Sarê li himber Hemo erza wî şikenandibû û ew piçûk xistibû. Heso hilda xwe rabe, lê nikarîbû. Eskerkî rûnişt û bi qîje wîj:
»Ê ne jina Circîsko, jina Circîsko binere ez rabim, ez ê te biçirînim ha! Waweylê, esas Circîsê herî mezin di mala min de ye û hîn jî min nas ne kiriye kuro!..«
Sarê jê danexwar:
»Wey Xwedê bike yek ji we kêr yek penêr be! Hema heçê ji we de ji ser hev vegere, ker di jina wî ...e û hew!« got û bi lez ji oda mêvanan derket. Temo wek çipik firiya û bi nav malan ket. Hemo da xwe ku here malê,

Heso peyivî:
»Bi ku de Hemo?«
»Ez dixwazim herim demaça xwe bînim.«
»Ka niha rûne heta ku kom bicive.«
Hemo şêwirdar û cîgirê Heso bû. Ev yeka ha bi dilê Sarê jî bû. Desteka Sarê û hinek jî pir ehmeqiya pizûriyan, Hemo di nav bêaqilan de kiribû aqilmend. Dema wî bixwesta dikarîbû piçekî Heso ragirta. Digel ku mirovekî nezanbû, dîsa jî gotina wî li cem Heso derbas dibû. Di gelek caran de biryarên Heso betal kiribûn û li gor lênerînên xwe kar meşandibû. Sarê jê hez dikir. Lê di rojên pevçûnan de, bi qasî ku nefret ji Heso dikir, ewqasî jî ji wî dikir. Hemo vê carê jî dikarîbû Heso haş bikira û rê nedaba pevçûnê. Lê serê wî bi xwe jî wek ê mezinê wî piçûk bûbû. Dema Hesen Çawîş lê êşkencê dike, ew Çawîş bi Îdrîs dişibîne. Ji pehînên Bîçer qolinc hatibûnê, bêî ku Heso bi xwe agahdar bike, xwe bi ser hev de eciqandibû û geft li Îdrîs û Circîs xwaribûn. Heso biderxistina pevçûnê, biryareke tam li gor dilê wî dabû.
Di hindurê nîv seetekê de ji bilî Hûto, temamê mêrên pizûriyan li oda
75
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Heso civiyan. Pizûrî bi mêrên xwe ji hûran hindiktir bûn. Ji bilî kesên cîran, pizûrî bîst û pênc û hûrî jî sih mêrên xwe hebûn. Lê ji ber ku herdu bendan jî Hûto bi pênc mêran dihesibandin, di pevçûnê de dibûn wek hev. Dema ku gundî bi pevçûnê diketin nav hev, pênc mêrên hûrî digel hev êrîş dianîn Hûto. Ew jî eger ne bi werîsan ba dîsa jî pê nikarîbûn. Pênc zilaman bi çar werîsan Hûto dixistin navbera xwe. Heryekî bi serê werîs digirt û wek babîsokê li dor wî dizîvirîn. Piştî ku Hûto bi fenda Cemşîtê şivan dihat girêdan, îcar herpênc mêr bi daran di-

belişîn ser. Lê li himber vê fendê, Hûto jî rêyekê ji xwe re dibîne. Di kêlîkên şer de hildikişiya ser xênî, du zilamên hevalbend kevir diavêtin ber û wî jî habela ev kevir di dijminên xwe de werdikirin. Avêtina kevirên wî bi xwe jî hêjayê temaşekirinê bû. Keviran li hewa mîna ferên aşan difîkand û bi teqil dihatin xwar; gurmînî bi erdê diket toz û dûman bilind dibû. Ji tirsa kevirên Hûto, hûran şer dadixistin binya bênderên jêra gund. Lê Hûto jî wî çaxî bi koçanîkan raserî wan dihat. Koçanîkên wî ji merşên mûyînî bûn. Benên koçanîkan bi kevnepotikên Sarê pêçabûn. Gava ku koçanîk dizîzikand û kevir diavêt, te digot qey topa malûmatê diteqe, xumîn û gumîn bi derdorê dixist.
Hemo li kêleka Heso pala xwe daye dîwêr û riniştiye. Luqman û Bedirxan li ber devê derî li ser pêyan digel hev dikin piste pist. Ji lepta wan xuya dike ku ew jî şer dixwazin. Heso oda xwe ji kevirên nicirandî bi haweyê bajarkî ava kiriye. Ode baş fireh e. Lêbelê pizûriyan bi qelebalixê ode li xwe teng kirine. Çar pacên odê hene. Dudu jê li başûr, herduyên din jî li roava dinerin. Ode yek tebaqe ye, lê bi qasî tebeqe û nîvekê bilind tê. Binê wê li ser qamekê ji kevir û betonê hatiye dagirtin. Ode li ser pênc maxan e. Ji hêla bakur ve du max jê li ser rewtên hesinî ne. Rewt hîn ji dema elemanan de bi dest xistine. Di gelek xaniyan de ev rewt hene. Navbera maxan yek metro ye. Max bi depan rapêçayî ne. Hin dep qelişî ne û betonê di wan re daye der. Li ser banê odê ji hêla başûr ve yektew tibabê çengekî bilind dîwarekî bi zeraqe heye. Dîwar êretî çêbûye. Kevir bêxerc reqifandine hev. Hindurê odê bêxemil e. Hindur bi du kulavên mêrdînkî raxistî ye. Kulav rengînî û nuh xuya dikin; lê herdu jî kevin in. Kilsa odê difiride û xwe bi mirov digire. Xuya ye ku kevirên kilsê baş ne şewitandine, kils nikarokî hatiye. Ji bilî sûretê Rûto li odê sûret tune ye. Sûret raserî cihê Heso daliqandî ye. Bavê wî, ji zilaman bêtir dişibe pîrekan. Mîna ku kose bû, bêrîh û simbêl û bi kezî ye. Çengelê luksê bi

bin zikê xênî ve ye, luks birine aliyê malê. Sobe sar e. Lûlên wê li ser
76

enîşkekê direjî bixêrîkê dibin. Enîşk hinekî kupyayî ye. Menqel tije arî ye û li ber dîwarê serşokê hatiye danîn. Lempe jî tam li jora Heso daliqandî ye. Bêhna mîzê ji serşokê tê. Heso di nêzîkî wê de li ser doşekê rûniştiye. Çixarê ji çixarê pêdixin. Temo, legana ku ji bo çixarên xwe tê werkin, di nîvê odê de daniye. Ava di hindurê wê de mîna pirika binê sarincan zer xuya dike. Remo dîsa avsîrk xwariye, bêhna nêriyan jê difûre. Nûrî mîna ku şorik xwaribe, pir avê vedixwe. Bi herî û rêxa binê şekalên xwe, devê derî seyandine. Zarokek bi dilşewatî li hewşê digirî. Dengê sêwiyan ji giriyê wê te. Keçikek e, lê qîza kê ye? Gelo ne be ev keçik li ser nanê genimî digirî? Belkî jî lingên wê ên xwas di nav heriyê de qerisî ne? Kesek guh li vê zarokê nake. Hemû jî bi dengekî bilind diaxivin û şêwira şer datînin. Zirtan dikin û xwe dizirzitînin. Zibêr nav di xwe de dide. Selîm li sênga xwe dixe. Kenêr destê xwe dihejîne. Simo xeberan dide. Hemo dikene. Ji herkesî bêtir Mihoyê cîran xwe daye pêş. Ne be ev keçika ku kezebê dax dide, keça wî be? Ji ber ku kufletê wî nanê ceh dixwe. Bi gavantiya ku car caran dikir, ji hin malan lewaşên genimî distendin û zarok hînî vî nanî kiribûn. Dengê Sarê tê...
»Lawê min Luqman, ma ji bo vê pevçûnê tu çi dibêjî?«
Miho ne hişt ku Heso dawiya peyva xwe bîne. Rabû ser kaban, mîna ku gergerekê bendê ew be, destê xwe hejand:
»Em nikarin çarika bênamûsiyê bikişînin serê xwe! Circîs û lawên xwe heşkere heşkere giliyê me li cem eskeran dikin. Eger wilo bimeşe û em bêvila wan nefirkînin, bi telaq wê heta bi giliyê jinên me jî li cem eskeran bikin!..«
Miho pir dixwest ku civatê navê wî bikira Tecal. Heyranê Kenêr bû. Ji

bo ku di qada wî de bilîsta, dikarîbû bûba xwedênenasê herî mezin. Yekî wilo bû ku dikarîbû bigota, »Îro gava ez li çiyê bûm, dengê kûçikan ji ezmên dihat!« Civat bi ehmeqiya xwe dikenand. Îcar Kenêr jî wê bigota »Rast e, ne tiştekî ecêb e ku dengê kûçik ji ezmên bê. Teyrek dikare cewrikekî hilgire ezmên û cewrik jî bireyê. Ma qey nabe?« Civat bi jîritiya xwe dikenand. Ferqa Kenêr û Miho ewqas bû.

Niyeta Miho û rawestinê tune bû. Wî dê hîn gelek gotinên ji xwe mez-intir li nav guhê civatê xista, lê Qasoyê cîran rê lê girt û bi şêweyekî nerm: »Lawo Miho hinekî giran be giran!«

Miho li Qaso zîvirî û beşişî:

»Kuro ma qey di nav vê civatê de wek min giran kî heye gelo? Wê rojê li Nisêbînê ez çûm ser qentarê û min xwe wezinand, bi Qurana ser çon-

ga melê ez tam nod kîlo derketim!«

Ji bilî Qaso temamê civatê pê keniya. Lêbelê ew hîn jî bi xwe şiyar ne bûbû. Devê xwe tije kir ku dîsa balê bikişîne ser Circîs, Luqman pê ve danî:

»Yabo, Îdrîs mirovekî fesad û dijminê riknê malbata me ye. Ez Hesen Çawîş ji nêzîk de nas dikim. Weke hûn jî dizanin nav min û wî xweş e. Hesen ne wek Bîçer mirovekî çavsor, telaqreş û derewîn e; deqarû û çav-fireh e. Wê roja ku ez ji Nisêbînê dihatim gund, li hindama qereqolê Hesen pêrgî min hat. Pakêteke tûtinê dirêjî destê min kir û got 'Luqman efendî, ez dixwazim tu vê pakêta dorsor wek diyarî ji dest min bigirî. Min pir dixwest ku ez diyariyeke mezin bidim te, lê mixabin destê min teng e.' Min pakêt ji destê wî girt û hema wilo yekser min destê xwe avêt bêrî-ka şerwêl. Ji sed û pêncî wereqî bi tenê sed wereqe bi min re mabû. Min

xelefa qenciya wî, bi sed wereqî lê vegerand. Eger hezar wereqe bi min re
heba, bi telaq min ê ew hezar jî dabayê.«
Gotinên Luqman li telê Sadiq ket.
»Hewce nake, tu xwe ewqasî li berxînî Luqman. Piştî ku tu hatî gund, te dîsa dikarîbû hezar wereqe ji nav malan peyde bikira û bigihanda destê Hesen Çawîşê xwe.«
Gotina wî li zora Luqman çû. Piştî ku got:
»Îsa Sadiq a te tiştekî din e, ez te fêm dikim« û dîsa peyv zîvirand ser Çêwîş.
»Nizamim gelo çavê we li Hesen Çawîş ket, îro gava dar li binê lingê apê me ê Selîm dihejmart, çav dikir min kuro! Yanî wek tiştekî bibêje, 'Luqman ez mecbûrî vê lêdanê me, min fêm bikin, weh! Ez esker im, nikarim bêdiliya qomandarê xwe bikim. Ma qey hûn dixwazin ku ez mehekê dereng herim mala xwe, hi? Bibexişînin, çênabe ku ez êşkencê bi we nekim.'«
Selîm bi coş rabû ser xwe û bi haweyê ku gotinên Luqmên bipeyitîne.
»Gava ku Hesen Çawîş bi daran daweriqandibû lingên min û ji lingan xwîn bi nav şeqên min de diherikî, çav dida min jî kuro! Heta dikire niçe niç û ax û wax jî! Luqman belkî te jî ew di wî haweyî de dîtibe, ma ne wi-lo bû?«
Luqman mîna ku temamê gotinên wî bipejirîne, serê xwe sê, çar caran hilda û danî. Ber bi derî de gav avêt, sekinî û di cih de li ser milê çepê zîvirî:
»Hesen Çawîş mirovekî rast...«
78

Xwest bibêje »Hesen Çawîş mirovekî rastgo ye, hîç derewan nake«, lê ji

qorziya odê Xelef lê qewimand:
»Herçi eskerên ser hidûd in, bi rastî wek qomandarên xwe teresbav in. Lêbelê divê mirov bizanibe Hesen Çawîş ji wan veqetîne û wek yekî ji xwe bibîne. Ev mirov hîç naşibe hevalên xwe, ecêb nedîno! Ma qey we ne
dît, gava ku ciwange xwe berdabû ser bênderan û bi xezeb ber bi me de dihat, qomandar xwe sil kiribû, çawîş jî li min dinerî û di bin simbêlan re dikeniya. Ji kenê wî mirov tê derdixist ku çendî dost e!«
Xelef ne dixwest gotinê zû biqedîne. Eger Zibêr şifqa xwe bi hinc li erdê nedaba û ne gotiba »Xwedê ji te raziyo bes e bes e, hinekî jî dorê bide min
ha!« Xelef wê civat bi dilovaniya çawîş hîn pir bisinciranda. Piştî ku got: »Allahummesellîela mûhemmed yabo dora te, weh!«
Zibêr tewirand:
»Hesen Çawîş mêrekî di ser xwe re ye. Nizanim gelo min ev meseleya xwe û wî ji we re gotibû? Pênc roj berê, li ser rêya Qesra pêrgî min hat. Piştî ku çixareke qûnsor da min wilo got: 'Zibêr efendî, ez dixwazim qesabiya qereqolê ji dest Cimo Aslan derxînim û te bikim qesabê qereqolê. Ma tu çi dibêjî?' Bi rastî ji kêfan devê min çû paş guhên min lo, min nema dizanîbû bê ez ê jê re çi bibêjim kuro!«
»Malxeranebo, îro pênc roj ev xebera wilo xweş li cem te ye, û çawa te ji me re ne digot!«
»De ka bihêle Hemo, bihêle ez bibêjim a tîr hîn di binî de ye bavê mi-no.«
Civat bêdeng bû. Te digot qey herkesî zimanê xwe daqurtandiye, hemiyan guhê xwe bi ser Zibêr de bel kirin û ziq li devê wî nerîn. Zibêr jî mîna ku deh mêr ji malbata hûran kuştibe, du zemberîş xistin ber pişta xwe, çîmên xwe ramidandin, li Sadiq nerî û bi haweyê ku dendigan

biçirisîne dest bi peyvê kir:
»Ez ji civatê hêvî dikim ku kesek tu gotinên çewt bi Çawîşê qereqola hidûdê me re neke. Di tarîxa vê qereqolê de, mirovekî bi qasî Hesen Çawîş peyde ne bûye.«
Bi van gotinan qesda Sêdiq dikir. Dizanîbû ku Sadiq nefretê ji temamê eskeran dike; dê wî bibersivîne û heta gotinên ne xweş jî pê re bike. Heso xwe ne girt:
»Erê Xwedê ji te razî be Sufyan, tiştê ku em dizanin nebêje. Hesen Çawîş mirovekî çendî bêbav û bênamûs e em hemû pê dizanin. Te civat di mereqê de fetisand, ka zû bibêje bê ji te re çi gotibû wî bêşeref î, weh!«

79

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Zibêr mîna ku Sêdiq biqeherîne bêhnikekê ji dil keniya. Kenê wî hinekî hovane bû. Sadiq ji bo vî kenî her tim jê re digot »Kuro Zibêr, tu wek bergîlê dikenî, şîhe şîh ji te tê!« Zibêr piştî ku hin ji civatê jî bi hîre hîra kenê xwe kenand, qûna xwe ji ser kulêv hilda û danî, cira xwe xweş kir û dîsa bi mirçe mirç:
»Yabo, gelî civatê, baş li min guhdar bikin, bi navê Hesen Çawîş dostekî me li qereqola hidûd çêbûye..«
Nûrî pala xwe dabû serşokê û di nav şekalan de rûniştîbû. Serşok bi qasî dikekê ji erdê bilind bû. Zibêr jî li dawiya odê bû. Nûrî wek pilingekî qe-vizî, li ber Zibêr rawestiya û destê wî ramûsand:
»Ez xulamê te bim xalê me ê Ebû Sufyan, yabo bêje bê tu ê çi bibêjî, te em çirandin haho! Vî Mihemedî çawa bi te re derxist serî!«
»Temam temam xwarzê, ka rabe here cihê xwe, ez ê bibêjim« û tozekî din keniya:
»Erê ey cemahet, Hesen Çawîş bûye hevalê me! Wî got ku ‘Ez bûme

hevalbendê pizûriyan. Ez hewedariya vê bendê li cem qomandar dikim...
‘ Ê ne we ne dît bê çiqasî kêfa xwe ji min re dianî!«
Civatê bi mûçinkê peyv ji devê Zibêr kişandibû. Ne hiştin ku Zibêr dirêj bike, gelekan jê bi yek devî:
»Na loo!«
»Erê erê, wilehilezîm wilo lo!«
Simo ji dil got:
»De îcar divê em vê dostayê ji dest xwe bernedin, eman eman ha!«
Heso keniya û qerfên xwe kirin:
»Niha tu bi qedirê Xwedê û pêxember kî Zibêr, ev tu ji dil dibêjî? Eger bi rastî wilo be, îcar çima hûn nabêjin em ketin dana Xwedê lawo! Bi xêra vî lawikî belkî barê zilma qomandaran hinekî ji ser me sivik bibe û bar bigindire ser milên segbavê Circîs û tuxmê wî!«
Zibêr xwe tevxirciland. Çîmên xwe ên radayî bi lez kişandin, zemberîş ji ber piştê herikî. Ew li herka zemberîşê hayî ne bû. Xwe pal da, reqînî bi dîwêr ket, qêriya û hişk bi serê xwe girt. Patika serî di cih de bi qasî xarekê werimî.
Sadiq beşişî:
»Kuro Zibêr, qey te derew kir lawo, loma serê te li dîwêr ket.«
»Ooh tu jî lo, ê hema bi telaq xilafî di gotina min de tune bû, ha!«
Hemo:
»Ez jî bawer dikim ku Zibêr rast dibêje. Ji ber ku pêleyek berê, dema
80

Bîçer gazî min kir û ez çûm qereqolê, Hesen Çawîş wek hudhudk li ber destên min diçû û dihat. Ling ne xist bin xwe, rûnenişt. Xizmet ji min re dikir kuro! Bi destê xwe çemçikeke av ji min re anî. Şabelot dan min. Mewîjên bêdendik ji min re anîn. ‘Hemo amca’ digot, kuro!..«

Sadiq hêviya gotinên wiha jê ne dikir. Xwe aciz dikir û di ber xwe de dikire niçe niç. Di dawiyê de xwe ne girt:
»Hemo, gava Çawîş ev zir camêr be, îcar çima em vî zir camêrî ji dêvla te û apê Heso ji xwe re nakin mezinê malbatê?«
»Sadiq hewce nake tu gotinan bi vir de û wir de bikişînî, xweşik bibêje ku ez ji pevçûnê ditirsim. Ji serî de keft û lepta te bala min kişandiye. Her mirovê ku bi qencî çêlî Çêwîş kiriye, tu di pêşiyê de bûye kelem û te ew terpilandiye.«
Sadiq rabû ser xwe û di nîvê civatê de sekinî. Berê xwe da Hemo û bi zirt:
»Heçê ji min û te de hema aniha Circîs û lawên wî hemiyan bi ser hev de nekuje û tev li sîlehê xwe nere xwe teslîmî çawîşê te, qomandarê te û generalên romiyên te neke, çarika jina wî li serê wî be! De rabe ha!«
Hemo hilda xwe ku rabe. Heso bi ser wan de hilbû, herdu li cihê xwe rûniştin. Heso bêî ku xwe bide pişt yekî ji wan, bêhna xwe teng kir:
»Ez, kerê Stenbolê berdim ser heftê û heft sûlala Hesen Çawîşo! Lêbelê birayê min, lawê bavê min Sadiq, tu çima me fêm nakî? Eger em pîşê bi eskeran nekin û bi temamî xwe ji wan bişon, wê yarê gonê Circîsko halê me bike halê helawçiyan. Cimo û Hacoyê pêşî çawa hevrikê hev bûn, em û Circîsko jî wilo ji bav û kalan de hevrikê hev in. Haco xwe ji dewletê dûr kir û li himber romiyan bi şer sekinî. Îcar Cimko çi kir tu dizanî? Li himber Haco bû hevalê romiyan û li kuştina Haco geriya. Bi eskeran re derket taqîbata vî fêrisî. Haco kete çembera Circîsko yanî Cimko, serê ‘siltanê hevêrkan’ jê kir û teslîmî romiyan kir. Hişê xwe bîne serê xwe ehmeq. Dema Circîsko bibîne ku me xwe ji eskeran vegirtiye, ew ê ji îro bêtir xwe di bin eskeran de vezilîne û me hemiyan bi aqûbeta Haco şa bike. Sadiq min digot qey tu bi aqil î, lê bi rastî carina tu xwe wek zarokan xaşomaşî dikî. Zû rabin ser xwe û herin lep û ruyên hev!«

Herduyan jî tu carî bêemiriya wî ne kiribû. Çûn lep û ruyên hev.
Sadiq bi qahr peyivî û ber bi serşokê de meşiya:
»Eskeran mala me viritandiye û em jî li dostaniya eskeran digerin!«
Gotina wî li hesabê Heso ne hat:
»Li cihê xwe rûne, bêşeref! Îsa heq ji vê şêwira niha dernakeve, ev ne

karê wî ye. Em şerekî şeytanî datînin. Di vî şerî de ne Îsa, Şeytan ji me re lazim e, te fêm kir bê min çi got?..«
Sadiq deng ne kir û serê xwe berda ber xwe. Lê Kenêr jî di bin simbêlan re keniya.
Sadiq û Hemo him pismam û him jî hevlingên hev bûn. Bi keçên Heso re zewicî bûn. Carina li ser berberiyê bi devjengê radibûn hev, lê engirandina wan hemû ew bêhnik bû. Hemo û temamê gundiyan Sadiq wek gula civatê didîtin. Hemo digot, »Civata bêî Sadiq wek girara bêrûn e. Civat bi Sadiq xweş e.«
Sadiq hevalê berberiyê bû, lê ne bi haweyê ku wan dikir. Ew jî mîna Sarê dijminê eskeran bû. Ji dijminahiya eskeran pê ve, ji xwe gerek tiştekî din nefikiriya. Ji ber ku eskeran bavê wî jî kuştibûn. Bê dê û bav, li ber destê Sarê û Heso mezin bûbû. Li gor wî, esker pêxember diba çi diba bila biba, divabû bihata kuştin. Wî her tim digot, »Ez bi yek şertî, aşitiyê digel hûran qebûl dikim. Em ê eskeran bikujin û em birayên hev in.«
***
Civata pizûran dawî li şêwira xwe anîbû. Di civînê de biryara pevçûnê sitendibûn. Xwe ji pevçûnê re hazir dikirin, hindik mabû ku xwe berdana gasînan, lê ji taxa jêr dengê Circîs ber bi taxa jor de bilind bû:
»Lolo pizûriyên muxbirçîîî! Bêşerefino, bênamûsino, ji pişt jinên xwe

derkevin; îro roja me û we ye! Xwe berdin meydana şer! Hesoyê fisek, ji dêvla ku tu keviran bi ser dawa me de bigindirîne, were sênga xwe bide sênga min berazî ku ez te bi terbiye bikim! Qaqubuxe qaqubuxe!..«
Circîs zilamên xwe hemû dabûn dora xwe. Di nav zilaman re ji vî serî diçû wî serî û mîna kewan qaqubuxe ji Heso dixwest. Te digot qey ew eşîra Lûlû û êv ên din jî eşîra Zûlû ne, herkesî rahiştibû dar, çakûç, bivir, sêgulîk, melhêb, debûz û şîşên tenûran. Ji bilî van çekan wekî din jî gelekan jê, xencer bi xwe re hilanîbûn. Perîxanê dabû nav koma zilaman, xwe ber bi Circîs de dikişand û digot, »Qamboncîko tu bûye kafir! Tu doza çi li vî miletî dikî hey kûçikan laşê te xwaro!..« Lêbelê Bozanê lawê wê, ew hişk zeft kiribû û bi nav pîrekan de dahf dida.
Dilê Heso ji kînê di ser hev re diwerqilî. Di vê bêhnika ku dengê di-jminê wî ê kevnar di guhê wî de olan dikir û ew dawetî meydana şer dikir, ji bo ku hinekî bi aqilî bifikire gotinên tirovirî neke, xwe piçûk nexîne û danekeve deraxa dijmin, temamê giraniya xwe berdabû ser mejî. Xwe bi
82

ser hev de dihesirand, lê mejî jî mîna dilê wî ziwa bûbû, li ser qenciyê çerx ne dikir. Ji bo ku aqilê xwe ê mayî jî bernede, gopal di lingê xwe ê birîn-dar de radikir. Xwe ne girt, qêriya:
»Kuro vî ez çirandim haho! Ma qey mêrekî ku devê wî tije fîşek bike û me hemiyan rûpak derxîne, di malbata min de tune ye!« û pizûriyan bi kîn xwe di hûran werkirin.
Ji qahra nava xwe hinan jê mîna serxweşan rê ne birin ser deriyê hewşê, xwe di ser sêncê re qevizandin û li yek tûşê xwe avêtin tara jêr. Pêşî di nav
malan de wek qertelan di hev re firiyan. Dûv re sênga bi sênga hev kişandin ser bênderên ku hîn ji xwîna wan ziwa ne bûbûn û bi keviran li

ber hev pan bûn. Kevirên yeklep li hewa dizîvirîn, geh li bin guhê hev diketin çirûskan pêtî didan, reqîn ji ezmên dihat geh li pişta yekî diketin dengê çifteyekê vedidan. Li aliyekî navtêdanên mêraniyê, fort û zirt û li aliyekî jî dîsa qîr û hewar û giriyê dayik û zarokan bû. Bi kevirê Luqman serê Haco pelixî û di nav xwînê de gevizî. Ketina wî sênga vî bi mêraniya sikakê nepixand. Berê xwe da Bozan û nav di xwe da:

»Ez nihîtê neqeba me! Kî ferx e, kî ribat e xuya kir! Tubbb werin min, werin min!..«

Metika Luqmên Perîxanê jî xwe avêtibû ser kelaxê lawê xwe, porê xwe dikişand, li kaba xwe dixist û bi dilşewatî digot:

»Lolo lawo, lolo ciwano, li min evdalê, li min pepûkê ez ê nifiran li kê bikim? Ez ê porê xwe bi ser kê de kur bikim? Ez ê çawa bigirîm? Li hêlekê lawên min û li hêlekê jî biraziyên min!..«

Bi ketina Haco re bayê şer bi carekê ve qulipî. Kevir nema di hev werkirin. Herkes bi aliyekî de bazda; dudu dudu, sisê sisê, çar çar xwe avêtin ber kuçan û demaçe li hev kişandin. Eger Haco bi derba Luqmên re wilo zû ne ketiba, belkî şûna kevir, demaçê negirta. Çimkî herdu rex-an jî di hemû pevçûnên xwe de heta ku li aliyekî tam teng nebûya, bi destpêka pevçûnê re tu carî dest ne diavêtin çekan. Wan baş dizanîbû ga-va ji terefekî mêrek bihata kuştin, wê terefê din him ji gund derketa, him talan bûba û him jî çend mêrên wan ên sereke bihatana girtin. Ji ber vê hindê, heta ku kêr ne gihaba hestî hevdu ne dikuştin. Digel ku piraniya wan bi tiving bûn, dîsa jî ji şerê tivingê direviyan.

Di kuç û kolanên gund de bi demaçan û navtêdanan tibabê çarîkekê hev bersivandin û gotinên kotî bi hev re kirin. Cîgirên serekmalbatan Bedran û Hemo di qorzîbirên navtarê de bi xeberan, mîna mitirban di-

avêtin ber hev. Bedran, »Lawê Xipşê, min sûnd xwariye ku te bikujim û wê dîlbera jina te bi xwe bihêlim!« Hemo jî digot »Lawê tirê, min ji xwe ji zû de dor li ser a te daniye!..«
Mîrzoyê mitirb, mamosteyê gund Erol Satici û Mele Salar pêşî xwestin ku wan ji hev navcî bikin. Lêbelê wê kê li wan guhdar kiriba? Hemû ji hev dagirtî, mîna guran har bûbûn. Mîrzo û Salar di nav şeg û pekên wan de birîn bûn û ber bi mal de bazdan. Mîrzo zarokên xwe xistin hindur, ji jina xwe Melesê re got, »Hek, keçê rabe reqsê!« û rahişt ribabê.
»Binya mala me bi dika
Hewa sibê hênika
Dadan me qûncilika
Em bûn dimsê elbika
Kesî neda lotika...«
Piştî ku Hesûk newqa Luqmên bi xwîn kir, pîrekên herdu hêlan bi qîr û hewar xwe avêtin nav meydana şer. Pîrekan dest dan hev, ketin navbera wan û rêz girtin; çarikên xwe ji serê xwe kirin avêtin wê navê û gotin: »Heçê ku şer bidomîne çarika jina wî li serê wî be!..«
Li gor adetên civatê, dema pîrekê çarik biavêta ser zilêm û zilêm li pîrekê guhdar ne kiriba, pir şerm dibû! Îcar di pevçûnên van herdu malbatan de, kêm caran zilaman wek pîrekan kiriye û şer rawestandine. Rawestandina şer a di vê carê de her çiqasî pîrek bûbin sebeb jî, di eslê xwe de ji ber ku herdu rex jî ji hal ketibûn şer rawestiya. Nema dikarîbûn pevçûn bidomandana. Bi derbên kevir û daran ji benda pizûran sêzdeh û ji benda hûran jî neh kes birîndar bûbûn. Di nav birîndaran de ê herî giran Haco bû.
Herkesî destê xwe di ber xwe re berda û li hev kom bûn. Pîrekan destên xwe sivik girtin. Bergîl, metreh, lihêf û werîs anîn ku Haco rakin bajêr.

Lêbelê Circîs erza wan şikenand, »Haco wê nere nig textor!« û heta ku jê hat pehînek li nav pişta Perîxanê xist. Zilaman, Haco xistin nav merşekî mûyînî û di nav xwe re birin oda Circîs.
Birîna Haco giran bû. Ji patika serê xwe derb xwaribû. Kevir bi qasî du movikên tiliyê serê wî qelaştibû. Li dor nîv seetê li erdê bêhiş ketibû. Xwîn pir winda kiribû. Madê wî mîna quşûfê zer vedabû. Haco di her bêhnikê de dikarîbû bimira jî. Circîs ev yeka ha fêm kiribû. Dizanîbû ku lawê wî di rewşeke xerab de ye. Eger Hacoyê xwe ê ku darîçav jê hez dikir
84

û ew di ser temamê malbatê re digirt, nebira nig doktor, dibû ku şev di ser re derbas ne bûba û çira mala wî bitefiya. Bi mebesta ku demaçên xwe
veşêre, xwe ji zilaman vedizîbû. Di qorziya êxur a herî tarî de çong berdabûn erdê û li ser lawê xwe, mîna baranê rondîk dibarandin. Tep li serê xwe didan, dev destên xwe dikir, zibil bi ser xwe dadikir û bi îske îsk digot:
»Eger ez te bibim textor, wê ew Hesokê bêşeref bavê te qelsek bibîne û navê min bi muxbirçitiyê derxîne. Ez naxwazim ev navê pîs bê ser malbata min. Lawo situyê bavê te bişike, gerek min nehişta tu têkilî nav şer bibî!..«
Circîs gava Hacoyê xwe bibra nig doktor, dê doktor bi pevçûna gund agahdar bûba. Wî, doktor û polîs û esker yekqumaş didît. Amintî bi doktoran ne dianî. Doktor dikarîbû di derbarê bûyerê de, xeber bigihanda esker û polîsan. Wê gavê jî davabû gilî bikira. Û gilîkirê pêşî jî, ew li ba ê din piçûk dixist. Lêbelê di eslê xwe de a bi rastî ne wilo bû. Di sala ku hevalbendê wî Sekvan hat kuştin, berî herkesî wî bazdabû qereqola Sitilîlê û gilî li Hemo û Luqmên kiribû. Wî baş dizanîbû heta ku kuştin

çêneba, bi giliyê ku bikira wê zerar ne gihandiba dijminê xwe.
Heso beşdarî nav şer ne bûbû. Ji ber ku pevçûn jê ne dihat. Ji lêdana eskeran canê wî hemû ecinîbû, xwe li ser pêyan ranedigirt. Bi lingê xwe ê seqet helbet wê nikarîba çend gopal dawişandana Circîs. Li hindur bi dîwaran re şer kiribû. Di kêlîka ku deng bi demaçan ketibû, wî jî bêrawestîn gopalê xwe li betonê xistibû, serikê gopêl şikenandibû. Serê xwe bêkeys li dîwarên odê dabû, serî zelhitandibû û gotibû »Ha wilo ha! Ez çavên we bixwim; îro roja belavkirina namûsê ye. Yekî ji wan sax bernedin, hemiyan bikujin; ev gund ya wê bi me û ya jî bi dêqahpan bimîne!« Lêbelê Circîs ji serî heta dawî xwe ji qada şer bernedabû; li gor zirtên xwe derketibû. Di şer de him serê wî hatibû şikestin û him jî ji nav pişta xwe sê derb kevir xwaribûn. Bi şikestina serê xwe mîna ku welatek feteh kiribe, bi xwe şanaz bûbû. Xwîna ku ji serî bi ser kincan de herikî bû û kinc kiribûn kulîlk, hemû wek terfî û rutbe dîtibûn. Pir dixwest ku destekî wî bihata şikestin, da ku di civatê de zimanê wî hîn bêtir dirêj bûba û bigota »Ez kurdûnde me, howeh li vê ecêbê! Wê lawên Hesoko neh zilaman ji me li erdê vezilînin û em ê jî bidin dû jinan û bazdin hindurê qul û qulêran, ha! Ê ne çi fêde Hesoko, dua ji vî destê min ê şikestî re bike. Eger ne ji destê min ê şikestîba, qe min yek ji we li ser lingan dihişt...«
85
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

***

Pizûrî hemû li oda Heso civiyan. Fîşeka ku Hesûk berdabû Luqmên, kêleka wî a çepê birîn kiribû. Birîna wî li ser lingan bi ispîrtoyê paqij kirin û ser birînê bi kitaneke qêlêrî pêçan. Ji bilî Sadiq, herkesî xwest ku biçin qereqola Sitilîlê gilî, lê Heso li himber wan derket:
»We tu gû belav ne kiriye heta ku em ya jî ew herin gilî bikin. Li ser

pevçûnên wilo bêxwîn me gelek caran gilî li hev kiriye, lêbelê ne bûye tiştek. Mehkemê ne em û ne jî himberên me hepis kiriye. Bila sebeb êm ê dîsa herin devê çawîşê Sitilîlê tije pere bikin û wê çawîş tiştekî ji me re neke. Qilawizekî bişînin ser xênî. Eger gava we dît hin ji wan ber bi Sitilîlê an rêya Îpekê de çûn, bizanibin ku ew ê herin gilî. Ev fisekî bila pêşî ji wan derkeve. Em nikarin xwe li himber Circîsko piçûk bixînin!..«
Heso gava wilo diaxivî çavên xwe ji ser Hemo danedigerandin. Bi haweyê ku »Te çi ma hin ji zuryeta Circîs ne kuştin?« awir tê difirandin. Bi qahr kefika gopalê xwe ê kelpitî di doşekê radikir. Gava kefik ji doşekê dikişand, hiriyê xwe li sîxikên qurmiçî digirt pê re dida der û li ser ruyê doşekê belav dibû. Di nav şeqên wî re doşekê mîna seradê qulqulkî diyar dikir. Pir bi heyecan diaxivî. Mirov digot qey pevçûna berî niha, wî bi tena serê xwe kiriye ku ewqasî helke helk pê ketibû.
Hemo:
»Lê ezbenî, mirovek ji me bi derba demaçê hatiye birîndar kirin. Birîna birîndarê me her çendî ne giran be jî, ji ber ku bi demaçê birîn bûye mehkeme wê wan sûcdar bibîne û hinekan ji wan têxe hepsê.«
Heso pêşî zor da xwe ku henekê xwe bi aqilê wî bike û bi ken wî biber-sivîne. Lê heq jê derneket. Xwêziya xwe daqurtand û hêdî hêdî:
»Me jî serê yekî ji wan pelixandî ye. Bi saloxdanan distek xwîn ji serê wî hatiye û li erdê tibabê seetekê bêhiş ketiye. Ez wilo bawer dikim dema wî bibin nig textor, wê textor kêmî du mehan raporê nedêyê. Îcar mehkeme jî wê vê rapora textor a du mehan, li ser me tam bi du sal heps bide rûniş-tandiin.«
»Rast e, wê birîndarê wan raporê bistîne. Heta gava bikaribin ji me bêtir pera bidin textor, bêşik textor wê vê raporê bike sê meh. Heta belkî bike çar meh jî. Meseleya raporê li ser pereyan û jêhatîbûnê ye. Lêbelê apo, di vir de bi qasî ku ez dibînim, mîna ku tu di ser hin tiştan re diqe-

vize.«
Heso bi vê gotinê veciniqî. Serê xwe ber bi Hemo de xwar kir û dîsa bi zirt peyivî:
86

»Çawa yabo qurbano, te çi got, te çi got? De ka dîsa bibêje.«
»Ez dibêjim ku em gilî bikin wê baştir be. Ji me û wan ew ê bêtir zerara xwe bibînin. Çimkî gava textor birîna ê me bibîne ew ê bizanibe ku bi demaçê birîn bûye û rapora xwe wilo girêde. Di wê navê re, qe em jî ne mirî ne, em ê devê textor tije pere bikin. Eger me dît textor xwe tam bi dest me
ve berda, ji xwe wî çaxî jî em ê bihêlin ku gulê demaçê bi gulê tivingê biguherîne. Bi raporeke wilo tebût, di îfadên xwe de em çendî derewan bikin û bibêjin ku hemiyan bi sîlehan êrîşî ser me kiriye jî, mehkeme wê derewên me wek rastiyê qebûl bike. Çimkî nikare neke. Ji ber ku rapor wek şûrê hezretî Elî bi hiner û qewet e!
Heso ji dil keniya:
»De ka bise Xwedê ji te raziyo, wilehilezîm te hiland lo. Te bihar ji me re anî kabokê. Xwezîka wek ku tu dibêjî, wilo bi rehetî ba.
Di mehkeman de helbet derba sîleh ji derba kevir bêtir sergêjiyê dide dijmin û zimanê mirov dirêj dike. Lêbelê mirovê me ê ku qaşo bi demaçê birîndar bûye, tiştek pê ne hatiye. Gule di ser çermê wî re xijiqî ye, mîna bista sincirî çerm alastiye û derbas bûye. Birîn şikê çêdike. Eger gava yek nebêje ev birîna gulê demaçê ye, wê mirov hîç bîr nebe ku birîn, birîna gule ye ji xwe.«
Hemo piştî ku got »Apo tu şaş î, gule perçek goşt ji kêleka Luqmên revandiye« û cihê xwe guhezt.
Heso bi gotina wî xwe mecbûr dît ku dîsa li birînê binere.

»Luqman ka were vir, ez careke din li birîna te binerim. Em ê bibînin bê bi rastî ez an hûn şaş in.«
Kenêr:
»Bi rastî, ez nizanim bê hûn dixwazin çi isbat bikin. Porê me di berberiyê de sipî bû, min pêncî derbas kir, navê me bû Şeytan û hûn rê nadin min ku ez çend gotinan ji we re bibêjim!«
Ev Kenêr jî fitnebazekî ku Zibêr nikarîbû av li destê wî bikira. Ji xwarin û vexwarinê bêtir hej berberiyê dikir. Di vî warî de bi qasî navê xwe jîr bû. Û ewqasî jî diz bû. Ji bo berberiyê çi lazim dihat, li ba wî peyde dibû. Xerabiyê di destê wî de wek seetê kar dikir. Bi tirkî wek bilbil dipeyivî. Dizanîbû bixwenda û binivîsanda. Ji bo ku navê şeytaniyê li xwe rast bike, Quran û kitêbên dînî û heta ên felekî jî xwendibûn. Mele nikarîbûn pê re têketana devjengê. Bêî izna wî melan newêrîbû meletiya gund biki-ra. Tiştê ku dibihîst hîç ji bîr ne dikir. Ewqasî devliken û wensxweş bû, heta bi fesadiya wî zewq dida mirov. Siqêfên wî wek şekir bûn. Ji diziyê

zewq distend. Didizî û dîsa li xwedî vedigerand. Malê diziyê ne dixwar. Deftera wî heta bi dev dagirtiye.
Rojekê ew û melê Xerêb li sûka Nisêbînê li hev rast tên. Mele gotinên ne xweş pê re dike. Ew jî bi xwe re hiltîne. Kenêr di şeva terawîhan de dikeve mizgefta Xerêb. Di van kêlîkên ku mele û sofî bi cezmê ketine, ji bilî şekala melê ên hemiyan didize û li çiyê dişewitîne. Bi kurtî, sofî ji mele dikevin şikê ku ev ê diz zilamê wî bûye. Çavreşiyê diavêjin melê û dûv re jî wî ji gund der dikin.
Jina Selîm û jina wî li ser dora tenûrê pevdiçin. Jina ê din serê jina wî dişikîne. Kenêr dîsa bi xwe re hiltîne. Di şeveke ku herkes li ser xaniyan

razaye ew hildikişe ser xaniyê Selîm. Derpiyê jinikê ji ber serê wê radike û bi dîrekê text ve dadiliqîne. Dibe sibeh herkes derpî dibîne. Ev ji bo jinikê eybeke mezin bû! Selîm ji bo vê yekê, dev û ruyê jina xwe dipelixîne.
Çend sal berê jî şêxê Tinatê li ser daxwaziya Sarê bi rêya hin endamên PDKTyê hatibû gund. Şêx herdu bendan li hev tîne. Lê li ser daxwaziya şêx, Heso mala Kenêr jî ji gund rakir bir Sarincê. Îcar vî mirovê fesad di hikmê neh rojan de sarincî berdan pêxêla hev. Yanî heyfa Zorava ji Sarincê hilanî. Kenêr piştî ku li Sarincê berberiyê li dar dixîne, bi mêvanî her roj diçe Gundik û gundikiyan jî berdide hev. Îcar dema ku berê xwe dide kuçûkiyan, aşitiya Heso û Circîs bîst û sê rojên xwe dadigire û aşitî têk diçe. Li ser daxwaziya Sarê û Heso Kenêr dîsa malê tîne gund. Sarê digot, »Eger me ew kafir dîsa ne anîba vî gundî, wê mentîqê hevdu biqe-landa!« Wî jî gotina wê erê dkir, »Pîrê rast dibêje, min xistibû serê xwe ku
temamê mentîqê berdim hev. Û dûv re jî şêx bixirînim...« Gundiyan navê wî kiribû »Şeytan!« û wî jî pir kêfa xwe bi vî navî dianî. Gava ku ji gund diçû gundên derdorê, zilamê ku pêşî ew didît hildikişiya ser xênî û bi dengê bilind bang dikir:
»Hat hat hat! Şeytan hat! Ey gundîno, bi telaq min tu gotinên xerab bi kesekî ji we re ne kiriye! Şeytan derewan dike, bawer nekin! Haho haho Şeytan hat, hat hat!..«
Di derbarê »Roja qiyametê« de gava ku melê gund digot:
»Di vê rojê de insan, mê û nêr, şilfîtazî ne û bi bafîka ku hev nebînin Xwedayê mezin çavên wan dixe nava serê wan.« Kenêr jî wê bigota »Xwedê bi aqilî ne fikiriye. Eger bi rastî wek ku tu dibêjî wilo be mele, ez ê xwe daqûl bikim û li pîrekan binerim...«
Rihê wî ji şêx û melan diçû. Misilmanî qebûl dikir, lê ne limêj û ne jî

rojî digirt. Ji xwe tu carî xwe helal ne dikir, her tim bi cenabet bû. Li ser vê yeka ha, ew û jina xwe gelek caran ketibûn qirika hev. Di dûmahîkê de jinik pê re dernaxîne serî û wî bi wî haweyî qebûlî nav livîna xwe dike. Temamê herêmê pê dizanîbû. Wan bi xwe digot.
Li cephê Circîs jî çend fitnebazên zîrek hebûn, lê ne digihan toza Kenêr. Di nav wan de ê herî meşhûr lawê Circîs Hesûk bû. Ji wî re jî digotin »Abanos.« Kenêr dersek dabû wî jî. Xwe ji Kenêr pir mezintir didît û di derbarê wî de li her derê zimandirêjî dikir. Rojek havînê seet li dor duwanzdehê nîvro ye. Hesûk ji Stilîlê tê gund. Kenêr maskê girêdide, eyaran li xwe dipêçe û diçe ser dara ziyareta Pîrkemêl. Dar di nav mezel de ye û rê di be re derbas dibe. Dinya bêpêjin e û kesek li wê navê tune ye. Hesûk digihê hindama darê, Kenêr bi dengekî ecêb diqêre û xwe ji darê diavêje ber. Hesûk di cih de ji desthilanîn dikeve û lal dibe. Kenêr direve. Hesûk jî li wê navê vezilandî dimîne heta ku şivan wî dibînin. Li gor ku digotin, li dor sê seetan li erdê mabû. Hesûk birin nig gelek şêxan, birin ba doktoran û dîsa jî bi ser xwe ve ne hat. Di dûmahîkê de Kenêr pereyekî baş ji bavê wî distîne û bi haweyên xwe, wî dîsa dike ê berê. Li ser ku çima ew rehet kiribû, demekê dilê wî û Heso jî ji hev mabû.
Heso bi qahr got:
»Kî dibêje em ê rê nedin te birayê me ê Şeytan! Tu topa mahlûmatê yî, tu teyara Atatirk î, tu bomba dawî ye; bêhna xwe fireh bike, ey serekê temamê şeytanan!..«
Luqman di nîvê odê de li ser kursiyekî piçûk û bêpiştek dan rûniştandin. Luqman bi qelafet bû; mîna bertelaşekî sitûr, gîtirqalind û li ser xwe bû. Sermezin, rûgirover û esmer bû. Bêvilşerbikî bû, lê simbêlan ev aliyê bêvila wî dinixumand. Simbêlên xwe bi haweyê omerkî bada bû.

Serikên simbêlan li mewîjê xistibû; serik mîna qiloçên beranan li ser ruyê wî rawestiyabûn. Enîbeş, birhûqalind û çavreş bû. Damarên mêraniyê di eniya wî de vekirî diyar dikirin. Kelefên qûnê xwe bi çar kenarên kursiyê de berdabûn, kursî di bin de vêl rawestiyabû. Xwas bû. Bi tenê lingê wî ê çepê bi gore bû. Gore reş û naylonî bû. Panî û sertiliyên gorê qetiyabûn. Lê wî bi tiliya xwe a qilîçanê gore li ser ferşê ling radigirt. Herdu destê xwe danîbûn ser çongan û bi alîkariya destan temamê qeweta xwe berdabû ser
lingan. Damarên ku di ferşên lingên wî de bel bûbûn, mirov dikarîbû yek bi yek bihejmartana. Kurkekî gewr lê bû. Xuya dikir ku kevin bû. Serpişt û berstika wî zelhitî bû. Di bin kurk de bi tenê sertaziyekî cawsipî li xwe kiribû. Sertaziyê wî ji sipî, rişk û guyê kêçan pitpitkî diyar dikir. Di qilêrê

de debixî bû. Qilêr, xwîn û xwêhdana ku di laşê wî de gihabû hev, mîna bereta gayekî bêhn dida. Dema ku çepilê xwe bilind dikir, wek ku ba li beretê bixîne, ji nişkê ve wexma bin çeng hawêrdor difûriya; bêvil di wexmê de dixitimî û sergêjî bi mirov re çêdikir. Luqman di nav xwe de tena şerwêl tazî kirin û nola libên tizbiyê li dor wî xelek girtin. Heso rê ne-da kesî. Tiliya xwe a işaretê tam hilda, bi qahr di birîna wî a zengirê de rakir û got »Ku derê vê birînê dişibe a demaçê, hi?«
Bi lepta wî re barînî bi Luqmên ket:
»Ayy yabo! Xwedê ji te raziyo te ez kuştim hinekî bi hêdî!« û pêl lê ket. Eger ne ji Casim ba, ew ê miheqeq serpiştkî di kursî werba. Lê Casim jêhatî derket, ew hişk zeft kir û ne hişt tê werbe.
Birîn ne wek ku Heso digot ewqasî piçûk bû. Gule bêî ku çermê tenik qul bike, di bin çermê qalind re firiyabû. Dewsa birînê ji hêla ku gule lê

ketibû bi qasî serikê şûjinê û ji hêla ku derbas kiribû jî bi qasî mewîjekê fireh xuya dikir. Herwiha di navbera pêş û paşê birînê de li ser çerm, işareta tiştekî ku çerm alastibe an şîş kiribe tune bû. Dema ku wan Luqman nuh anîbû odê, Heso berî herkesî qutikê wî jê şemirandibû û li birîna wî temaşe kiribû. Qutik û şerwal ji rexê birînê ve yekser bi xwîn bû; xwînê di qazaxê wî ê hirî re dabû der û gihabû çakêt. Gerek ji herkesî çêtir wî ji rastiya birînê fêm kiribûya. Ji ber ku pîş bi dermên û doktoriyê dikir. Him gulê gava ku li ser tiliyekê çerm şîş kiriba, ewqase xwîn dê ji çerm nehata.

Hemo bêvila xwe firkand û bêî ku bêvilê berde axivî:

»Apo, gule çerm şîş ne kiriye, di bin goş re firiyaye. Di birînê re du qul xuya dikin, baş lê binere.«

Heso paş de gav avêt. Lê gotina ku berî niha kiribû, bi haweyekî aqilane parast:

»Rast e, wek we ye; gule di bin goşt re firiyaye. Lê dîsa jî ne hêja ye ku mirov xwe bi vê birînê re biherimîne û biçe gilî. Birayên mino, divê em hev fêm bikin. Textor ewladê zinê ne. Ew dikare baweriyê bi gule neyne û bibêje ku, vî mirovî bi şûjinê çermê xwe qul kiriye. Lêbelê eger baw-eriyê bi gule bîne jî, wê tu raporeke wilo hêja nenivîsîne.«

Heso a di dilê xwe de hîn ji serî de gotibû. Lê ji bilî Kenêr kesî ew fêm ne kiribû ku dixwest, gule hinekî bi berjêr de çûba, hinavên lawê wî bi-terişiyana û bi delîlên qewîn biçuya gilî.

Hemo û Miho bi yekdevî:

»Apê Heso eger tu bi a me bikî, em gilî bikin baştir e.«

90

»Çima baştir e? De ka wê bibêjin.«

Hemo:

»Baştir e ji ber ku bi kêmanî hema wê esker doza sîlehan li wan bikin. Ez Circîs baş nas dikim: Li ber lêdanê xwe nagire û wê sîlehan teslîm bike. Îcar ma ne baş e ku him esker li dijminê me bixîne û him jî sîlehên wan ji wan bistîne?«
Gotina vî ji herkesî bêtir li hesabê Miho hat. Xwest ku piştgiriya Hemo bike, lê Sadiq madê xwe tirş kir:
»Na na, ezbenî ne wilo ye. Dema ku gilî serguherî têhildana sîlehan bû, ew jî wê di sîlehên me hildin. Hûn baş nafikirin. Him ji xwe gilî bi malbata me nakeve, mirovên qels gilî dikin.«
Heso:
»Sadiq rast dibêje. Ez jî di wê baweriyê de me. Vî eskerî dema sîleh ji dijminê me sitend, wê ji me jî bistîne. Bi berberiya nav me dizanin. Ji bo vê berberiyê em her meh qiyameteke pere didin wan! Di gundekî de, gava terefekî rahişt sîlehan, bêdevjeng terefê din jî wê rahijê. Eskerên tirk ne zarok in, ji me çêtir dizanin. Vê meseleyê qut bikin. Em jî gilî nekin heta ku ew li me gilî nekin. Ma tu çi dibêjî serekê şeytanan?«
Kenêr bêsebir di cihê xwe de diqeliqî û çixare ji çixarê pêdixist. Di her şevbihêrkê de civatê ew dabaş digirt û wî jî tiştek bêbersiv bernedida. Ji herkesî bêtir ew dipeyivî. Îcar Heso jî di her rojên qewamê de gava bi koma xwe re rûdinişt, ne dihişt ku Kenêr bipeyive. Ew dihişt dawiyê. Wî bi vê yekê dixwest ku Kenêr lê hûr bibe, gotinên civatê wek melhêbê di bêndera mejiyê xwe de bi kar bîne û dûv re biryara xwe bide. Di vî warî de gotina wî her tim rast derketibû. Heso ew wek wezîrê xwe didît. Lêbelê digel ku wî bi xwe jî bi vê yeka ha dizanîbû, dîsa jî lez li xwe dikir û diqeliqî.
»Mirovên qels gilî dikin. Her çiqasî ev gotin rast be jî, di bingehê xwe de xurtên mezin qels bi xwe ne. Ew giliyên wan ji xurtayê tê. Îcar ku em a din bibêjin...«

Giran peyivî civat tênegiha. Wî bi van gotinên xwe ên tevlihev xwest ku Sêdiq ji derb bixîne. Li nav çavê wî dinerî û diaxivî. Çi gotina ku li hesabê wî nehata, bi gotineke qewîn fik dikir. Yekî agir, ê din av dipijiqand. Dinyaya wan ji hev cihê bû. Yek dojehî yek bihuştî bû. Wek şahirên nezan nizane bê çi dibêje, çend gotinên girover û ziwa, ku şil ba belkî bi derekê ve bizeliqiya, digindirîne wê navê, xwe zana diyar dike û direve. Civatê bi yek devî:

91

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Me fêm ne kir bê te çi got. Tu ka a pêşî biqedîne, dûv re were ser a din...«

Vî fesadî wê çi bigota? Nikarîbû tiştek bigota. Bi haweyê ku civat pir xeşîm û ew jî pir jîr e xwe nepixand:

»We fêm ne kiribe ez çi bikim yanî! Erê, helbet esker û heta hikûmet jî dizane ku sîlehên me hene. Çavên xwe ji me re digirin, ji bo ku em hev bikujin. Lêbelê gava me dev ji sîlehan berda û me dijminê xwe ne kuşt, wê dijmin jî wek me bike gelo? Na. Yanî gava em nerin gilî, wê Circîs jî nere gilî gelo? Wê here. Helbet berberî ne baş e. Lêbelê ma wê Circîs dev ji berberiyê berde, hi? Na. Circîs niha li qereqolê ye« û devê xwe girt.

»Yanî tu dibêjî em gilî bikin?«

»Erê apê Heso.«

Simo:

»Eger hûn bi amin bikin, em ê çend deremêtan di bin xaniyê Crcîs de bi cih bikin û hemiyan bikujin. ku ne bi wilo be, em ê tu carî ji qereqol û mereqolan xelas nebin. Heta ku Circîs û zuryeta xwe hebin, em ê her tim li ber devê deriyê qereqolan bin û hew!«

Heso:

»Wileh tu baş dibêjî, lê nizanim bê ez ê çi ji te re bibêjim...«
Vî Simo jî di sinhetê xwe ê fesadiyê de bi Zibêr re gav diavêt. Lêbelê ji konebaziyê bêtir ehmeqşeytanî bû. Belkî tozekê ji Zibêr li pêştir ya jî li paştir bû. Gundiyan demekê jê re »Deqdenos« gotin û dûv re dev ji vî navî berdan û bi navê wî ê rastî bang kirênê. Wî ne bi tenê ev gund, dinya dabû ber xwe. Hesin, kaplo, barûd, deremêd, pîl, empûl û têl li xwe civandibûn ku sîlehekî çêke. Û bi vî sîlehî temamê dinyayê bişewitîne.
Sîleh çêdikir û ji Kenêr re digot:
»Howeh kuro, ez li teqandinê dimînim heyirî! Ez nizanim bê ez ê çawa vî sîlehî biteqînim ku tiştek bi min neyê...«
Kenêr jî digot:
»Bi rastî terî ji te kêm e. Dibe ku ez bikaribim rêyeke teqandinê ji te re bibînim, lê ehmeqo gava ku te bi vî sîlehî tiştekî bi rih li vê dinyayê ne hişt, tu ê bi tena serê xwe çi bikî? Tu ê kê û kê berdî hev, tu ê bêfesadî çawa
bikaribî bijî?..«
Gotina vî dikeve serê wî, dev ji wêrankirina dinyayê berdide. Aliyê Simo ê herî girîng ku motomanekî ji serxweçûyî bû. Gava ku derewên beloq dikirin û civat li himber derewên wî disekinî, derew pê dibûn rastî û wek rastiyê diparastin. Ji ser a xwe danediket.
92

Ji wîzwîza çûk û teyrikên çolê xuya dikir ku royê xwe berdaye tasê, qasekî din wê here ava û Zorava dê dîsa di bin reşaya ezmên de bimîne. Çûkên beytik ji xwe ji zû de ketibûn hêlînên xwe û xwe di nav qirş û palê de veşartibûn. Ji zerzûl û reşêlan, darên behîvên nav rez bi carekê ve reş bûbûn. Kolekan hîn xwe ji ser bênderên gund neda bûn alî. Lê wan jî bi lez nikil di erdê radikirin. Hin zarokan mêrdewan li ber xaniyan danîbûn

û li qulê çûkan dixebitîn. Mele Salar li ber deriyê mala xwe haziriya bang-danê dikir. Êşkencek giran dîtibû. Bi zorê xwe li ser lingan digirt. Ew jî eger pala xwe nedaba hêtekî. Civata Heso jî digel ku bi seetan birçî û tî bi heraret axivîbûn, heta ku mele bang ne daye, ne Xwedê û pêxember, ne limêj û ne jî zikê wan ê birçî hatibû bîra wan. Ji bilî ku xerabiya hev bi-fikirin hîç, erê hîç tiştek di bîra wan de ne hatibû. Reşayê xwe berdabû hinduran, ode tarî bûbû. Lê wan ji hingama ku dikirin, bîr ne dibirin ku lempê ji xwe re pêxin. Di vê navê re, ji herkesî bêtir halê Kazimê pizûrî ne xweş bû. Kazim tibabê du seetan bûbû ku li ser xênî qilawizî li nav malan dikir. Ji serma dirikrikî. Li ser qesira Circîs pêgirtiyê hûran Ekremê torî jî wek Kazim bûbû qilawiz û ziq li mala Heso temaşe dikir.
»Weh mele bang dide! Çi zû bû mixrib, wey wey wey!..«
Xelef destê xwe avêt zincîrê ji bêrîkê seet kişand û ber bi çavên xwe de anî. Hindur reş bû, seet ji hev ne fesiland. Rabû ser xwe û wek dînan li dor xwe nerî. Li pencerê digeriya. Pencere li pişt bû, lê aqil ne dikir ku li pişt xwe bizîvire. Ew hîn di wê rewşê de bû, Zibêr ji devê derî peyivî::
»Wey erê bi Xwedê Heso, kuro bi rastî mixrib e! Seet pênc û çarîkek bûye. Melê gerek li pêncan azan bida« û derket.
Sadiq ji dil keniya:
»Kuro qey mele jî wek me xurifiye, lawo...«
Sîrac keniya:
»Xwedê ji te raziyo Sadiq qe seet jî naxurif e!«
Sadiq di bersiva wî de:
»Belê belê ew jî dixurife. Di hindurê seetê de şeytan heye. Bi telaq şey-tan jî nikare bi vî gundî. Me qûn li şeytên qetandiye, îcar em ê çawa qûnê li melê ku tew hîn nikare bifire, neqetînin! Bêhna xwe fireh bikin, hûn ê bibînin eger mele di vî gundî de hiş berneda, mêja eşa bi hesabê nîvro û a nîvro jî bi hesabê eşa ne kir û berê me hemiyan neda bakur, ji xwe bila

ez ne ji pişta bavê xwe bim...«
Civat hemû rabû ser xwe. Herkes bi haweyê ku bi şev dîsa li mala Heso li hev bicivin, garankî ji odê derketin. Lê Sarê li hindurê malê

pêrgî wan hat:
»Pizûrîno bi ku de? Lawo me şîva we kavirek ser jê kiriye, şîv hazir e. Ma ne eyb e ku hûn bêşîv ji mala me derkevin? Qey hûn me kêm dibînin?..«
Sadiq gotina wê birî û bi dengekî bilind got:
»Keçê pîrê hema ez bi heyrana te bim, lê! De ka were ez destê te maçî bikim, were! Ê hema bi telaq tu ji me hemiyan bi namûstir î. Eferim, diya Luqmên eferim.«
Sarê pêşî keniya; dûv re destê xwe bilind kir û bi hêrs got:
»Na na Sadiq, ez ne diya wî bênamûsî me; ez diya Reşoyê çavreş im, çavreş. Ker di diya Luqmên û temamê zaroyên min...n!« û li hindurê malê vegeriya.
Bi peyva ku Sarê got »Me kavir ser jê kiriye«, qurpînî bi dilê Heso ket. Qasekî xaşomaşî bû. Dûv re mîna ku hin jê re bibêjin, »Pêwîst nake êdî tu xwe aciz bikî. Kavir nema bi rih dibe, şikiriya xwe bîne ku jinikê ga ser jê ne kiriye birako!«
Sarê aveke hênik bi ser dilê wan ê helhilî de dakiribû. Şîva wan goşt û tirşika fasûliyan bû. Ji du mehan carekê bi zor û heft belan incex ruyê goşt didîtin. Ew jî ya fêrîkeke ku zarokan derb lê daba, ya mirîşkeke ku bi êşê ketiba û ya jî cûmek goştê meksûd bû. Di nav neh, deh kufletên hûr û mûr de mirîşkek wê bûba çi? Wê kê bixwara û kê nexwara? Heta belkî hi-nan ji wan ji salê heta salê ruyê goşt jî ne dîtibûn. Hemû bêî ku li bendî

gotina mezinê malê Heso rawestin, bê ka mezin çi dibêje, di cih de li hindurê odê vegeriyan. Dualî sef girtin. Çong berdan erdê, eskerkî rûniştin û cihên xwe xweş kirin. Baş bû ku Sêdiq bîr bir û lempe pêxist. Eger ne ji Sêdiq ba, kî dizane belkî di wê rewşa tarî de, hemiyan dê şîva xwe bixwarana û dîsa bi devjengan rahiştibana hev. Sarê disteke goştê pez ji wan re li êgir kiribû. Ev pez kavir e û goştê kêvir bi qasî goştê berxên hilikî xweş bû. Hiş û sewdan ji serê wan firiyabû. Hemiyan dixwest xwe bi heyrana Sarê bikin. Zibêr di bin tesîra goşt de ji hawhaw ketibû. Ji dilê wî dihat ku Sarê bi gotinên herî kubar bipesinîne, lê gotinên layiqî mezinahiya wê, ne didîtin. Devê xwe xistibû guhê Miho û bi dizî jê re digot, »Ez dest û lingên wê maçî dikim, maçî dikim maçî dikim...« Eger Sarê di vê kêlîkê de, ji xwe fedî ne kiriba û bi siqêfên kotî dabelişiya civatê, ji kêfa şîvê re belkî gelekan ji wan ew siqêf ne bihîstibana jî. Dualî birçî bûn; him birçiyê goşt û him jî birçiyê fesadiyê bûn. Dîsa eger Sarê aqilî kiriba û ji serî de civat bi vê bûyera xwe agahdar kiriba, miheqeq wê hin
94

mirovan bi milama qenciya vê pîremerdê, seyra devjengê lîçekî serguherî xêrxwaziyê kiriba, an devjeng dê ewqasî genî nebûya. Ji rewşa wan xuya dikir ku çendî li ber goşt ketibûn. Mirov di çavên wan re didît ku ew di vê bîstikê de ji goşt pê ve tiştekî din ne difikirîn. Ji bilî Heso hemiyan mîna guran bi awirên xwe ên birçî devê deriyê odê hûr hûr dibirîn.
Teqe req ji aliyê malê bilind bû, çingîniya firaxan li odê deng veda. Pêl kete civatê. Herkesî mîna ku xwarin li ber be, xwe ji xwarinê re hazir kir û ziq li devê derî nerîn. Dema ku Temo bi leganeke birinc û ser birincê jî tije goşt kete hindur, herkes ji hindama xwe de bêhemd rabû ser xwe û bi

haweyê ku heryek terbiya xwe şanî ê din bide ji hev re gotin, »Kuro eyb e
ji we re, hinekî alî Temo bikin, weh!« Legan di ser destên hev re herikandin dawiya odê û li ser kom bûn. Lê Sadiq hevalên xwe nas dikir. Digel legana duduyan hîn bi rê de li hewşê got, »Leganeke din hat, leganeke din« û bi lez xwe avête hindurê odê. Bi dû wî de Meyro hat. Li ser destên wê sêniyeke dorniqirî tije birinc û ser birincê yekser bi goşt nix-
umandî bû. Xuya bû ku bi lez sênî dagirtibû. Qiraxên sêniyê ji libên bir-
incê paqij ne bûbûn. Birincê ji nîvê sêniyê bêtir, li ser qiraxan diyar dikir. Lê Meyro hîn ne gihabû ber Heso, li şekalan likumî, hindik mabû bike-
ta. Meyro li ber xwe ket û xwe hinekî bi ser hev de qurmiçand. Sadiq bi exlaqê xweha xwe dizanîbû ku çendî dilkeçikî ye, dikare di cih de bigrî. Keniya û got:
»Keçê ez jî li şûna te terpilîm. Wan şekalan ji wir biavêjin« û yekser sênî ji dest girt.
Sênî li ber Heso danî û bi lez dîsa li hindurê malê vegeriya. Sadiq ji aliyekî de û Temo ji aliyekî de, tam pênc sênî tirşik kişandin hindur. Sênî sifir bûn. Hinekî mezin bûn.
Meyro jineke dirêj, gewr û xwînşêrîn, henûn û misixur bû. Vê pîreka diltenik, wek zarokên ku hîn ji dinyê fêm ne kiribûn, nizanîbû bigota »Na.« Kê çi jê bixwesta wê didayê. Heso carina henek dikirin û jê re dig-
ot »Keçê, xwe hînî gotina na-nabe, bike. Binere hin dikarin ramûsanan ji te bixwazin. Ji bo ku tu xwe bi dest kesî bernede, xwe hînî van herdu goti-
nan bike... «
Zarokan bi satilan av dikişand odê. Lêbelê hayê kê ji avê hebû. Digel ku hemiyan ewqas lêdan xwaribûn û dûv re jî şerekî mezin kiribûn, qaşo

gerek bi satilan av vexwaribana, ava çi! Di vê dema ku herkesî xwe dadaye
xwarinê û nehişî gepê dadiqurtîne, ji ser xênî dengê Kazimê pizûrî hat,
»Hûto hat, Hûto!«

95

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Bi dengê Kazim re Sadiq keniya. Lê ên din mîna ku tu cereke ava qerisî bi ser wan dakî di cih de rawestiyan. Tepsiya Heso ji ser çongan herikî; birinc û tirşik rijiya û goşt bi ser doşekê de belav bû. Heso di dilê xwe de piçpiçî. Di dawiyê de xwe ne girt û teqiya:
»Wey ne li ser xêrê bê! Xwedê heft topan li mala wî xîne! Erê hûn bi qedirê Mishefa Reş kin, ma niha wextê hatina wî bû lo!«
Raberdana Heso a li himber Hûto bi dilê hemiyan bû. Pir dixwestin ku Heso bêyefş jê re xeberan bide û ew jî hîn siviktir bikaribin gepan bihep-işînin devê xwe. Çimkî bêdengiya di ser xwarina bi tevayî de, rê li xwari-na bi fahşitî digirt; mirov li hev dinerî ji hev fedî dikir û bi isûl dixwar. Lê mixabin Heso jî mîna ku bêisûliyek kiribe, devê xwe girt û bi geremola dor xwe daket.
»Zibêr, nebêje ku Miho ehmeq e û ez ne dîtime ha. Min dît bê te çawa bi xezeb pariyek goşt xist paşila xwe.«
Zibêr li vî gundî xwedî erd û pismamê Heso bû. Ev yeka ha hîç pê ne diket. Belkî jî dizî pê re bûbû wek nexweşiyekê.
Wî jî wek wî devê xwe xist guhê wî û bi dizî jê re got:
»Hişşş deng neke. Tu jî bidize lawo, keysa me lê hatiye.«
Miho piştî ku di ber xwe de beşişî:
»Kuro ji xwe ji zû de min paşila xwe dagirtiye. Lê ma te dît ku bê min çawa bêrîkên qapût ên hindur ji birincê dagirtine?«

»Na lo! Lawo min digot qey bêjiyê mezin ez im, lê tu ji min jî hîn bêjîtir î! Wileh ne ez bi diziya goştê te û ne jî bi diziya birinca te hisiyame.«
»Miho, ser darên behîvan tije reşêle bûne, hema piştî ku civat belav bibe ez û tu em ê herin wan. Binere eman eman bila kesek pê nehise! Em ê çima van tiredînan bikin şirîkê xwe. Lawo, bi Quran heryek ji me wê disteke goşt bigihêyê!«
»Temam temam, min fêm kir, em ê herin, qut bike, dîwar bi qul in hişşş!«
Di her şevên zivistanê û bi giştî jî di rojên seqemî de reşêle û herwiha gelek teyr û tilûrên din jî bi refan li ser darên behîvan dilûstin. Ji ber ku rez duperçe bû, perçê jêr ê Circîs û ê jor jî ê Heso bû û darên behîvan jî hemû di nav rezê Heso de bûn, hûrî ji goştê teyr û tilûran mahrûm di-man. Pizûrî her şev diçûn nêçîrê û zembîlên xwe ji goştê teyrikan dadi-girtin.
Hûto hîn li dor rez bû, Doguj bêhna wî kiribû û bi lez û bez çûbû pêşiyê. Hûto destên xwe li situyê wî gerandibû û ruyê xwe bi ruyê wî ve
96

firkandibû. Doguj ji Temo bêtir hogirî wî bûbû. Bi rastî ev kûçik te dig-ot qey ne heywan bû, mîna insên fehman û bîr dibir. Dema ku eskeran bi G3an li Hûto girêdabû û Hûto ber bi Dêrê de direviya, Doguj jî hilk-işiyabû ser bena rez û bi hêrs direya. Ji rakêşîn û kêferatê, toqa hesinî situyê wî birîbû. Sitû bi xwîn bûbû.
Hûto gava xwe avêt hindurê odê û li paş xwe nerî. Kûçik ne dît. Kûçik berî wî ketibû hindur, lê hayî ne bûbû. Heso qîr da:
»Haho ev çi ecêb e! Lawê berêz zû wî kûçikî derke!«
Lê Sadiq bi haweyê ku lewlewa Heso bibire û herwilo Hûto jî li ber xwe nekeve, sivik pêrgî wan rabû. Li ber kûçik rawestiya, destê xwe di ser serê

wî re bîr û anî.
»Ji xwe re li vî kûçik-insanî binerin, bê çiqasî bi aqil e. Mêrik hatiye civatê ha. Qey dixwaze şîretan li hinan ji me bike« û digel Hûto bi kûçik re derketin hewşê.
Di wê navê re jî Heso bi ser Sêdiq de dikir birebir:
»Kuro destê xwe nede wî kûçikî, te xwe herimand!..«
Hemo û Xelef ji ser xwarinê vekişiyabûn. Vekişandina wan di esasê xwe de ne ji ber ku têr xwaribûn, ji bo Hûto ev camêrî kiribûn. Hema çawa ba, Hûto hevalê wan û dijminê dijminê wan bû. Him ma ne wî jî wek wan, di vê roja seqemî de ji destê eskeran êş û cefa kişandibû. Pariyek goşt
û çend lep birinca ku Sarê xîç çêkiribû, bixwara wê çi bûba qey. Ji bilî wan, kesî xwe ji ser sifrê neda alî û sifre ji dêwê malbata xwe re bernedan. Hûto bêî ku hin jê re bibêjin »Kerem bike ser xwarinê«, hema wilo li bayê hatina xwe kabok berdan erdê, zendik çikilandin û destên xwe ji xwarinê re vemaltin. Lê mixabin hinekî dereng mabû. Ji xwe goşt hîn ji serî de qediyabû. Birinc jî gihabû terka dawiyê, binê leganê diyar dikir. Rewş pê zor hat. Di ruyê wî re xuya dikir; rû reş gewirî bû. Pêşî destê xwe ê çepê avêt leganê û bi tenişta wê girt. Birinca Sarê tam çivir bû; te digot qey bi rûn kelandibû, birinc di nav rûn de mixmixî bû. Hûto serê tiliyên xwe xistin binê leganê û bi tiliya girdikê tenişta leganê dewisand. Wî çiqasî dewisand tilî jî ewqasî çû xwar. Terkek mabû ku leganê qul bike, ji nişkê ve tilî hilda û di dilê xwe de got, »Miheqeq pîra Sarê hesabê min û xwarinê kiriye.« Lê gerek hîn ji serî de wilo bifikiriya. Ji ber ku her tim gava Sarê didît xwarin û gava ku xwarin didît, Sarê dihat bîra wî. Di vî gundî de bi tenê Sarê qîmetê wî digirt û ew fêm dikir. Ji destên diya xwe bêtir, ji destên wê tahmtîtk xwaribûn. Eger ne ji Sarê ba, belkî wilo betil jî mezin ne bûbaya. Piştî ku Sarê hat bîra wî, hîn nuh bêhna wî derket û

lepê xwe dirêjî hindurê leganê kir. Bi tûşa pêşî re şiyar ne bû ku digel birincê goşt jî hebû. Çawa lepê duduyan avêt devê xwe, rûnê di binê leganê de û cûmek dûv, kortika qirikê şil kir. Mîna gulekê vebû. Pê hisiya ku bi birincê re goşt jî heye û birinc birinca ber goşt e. Vê carê jî tam bi haweyekî hovane kişiya ser. Bi herdu lepan xwarin da ber hev û mîna dewlên li ser devê bîr û birkan, lepek hilda û yek danî. Lê çi fêde, tu xwarin nema bû. Di vê kêlîka ku binê leganê bi kefa destê xwe paqij dikir û kef dialast, ji beragirka xwarinê dengê Sadiq hat:
»Hûto xwe bigire, ez bi leganeke birinc û goşt bi te ve giham.«
Hûto ji kêfa xwarinê re serxweş ketibû. Ji cihê ku lê rûniştîbû çeng bû, qêriya, »Ooox goşt, goşt!« û bi haweyê hirçê xwe kiland. Legana tije birinc û goşt ji destê Sadiq revand û li wê navê ket ser.
»Howeh kuro, îro hindik mabû ku qomandar pîra me bikuşta! Ez dibê Xwedê di ber pîra me de ciwange feda kir, hûn çi dibên? Ciwange kir setqa wê.« Civat hemû pê keniya.
Hûto heta ku bûbû zilam jî bawer ne dikir ku Xwedê li ezmên rûdine. Niha jî bawer ne dikir. Ji bo ku dilê Sarê jê nemîne wilo dikir. Li gor wî Xwedê insanekî wek çiyakî mezin bû û çênedibû ku ev çiya bêsenede û menede li hewa rûnişta. Ji xwe hîç bawerî bi pêxember ne dianî. Sarê pêxember pê insan dabû naskirin û jê re gotibû »Pêxember û şêx difirin ba Xwedê.« Ecêbmayî dima! »Yanî bêî ku li terempêl û teyaran siwarên ha!..« Ne diket serê wî û ne jî dixwest ku dilê Sarê ji xwe bihêle. Mereq dikir ku insan çawa bêbask, terempêl û teyare dikarin bifirin. Di rojeke havînê de bi sariya sibehê re diçe ser qesira Şêx Ataullahê tinatî, herdu lingên wî zeft dike, wek koçanîkekî dizîzikîne û dizîzikîne, li ezmên

temaşe dike û virikî diavêje. Şêx hîn li hewa ye can dide. Li gor ku digotin, serê şêx dipelixe û hestîk sax di canê wî de namîne. Îcar piştî vê bûyerê tam bawerî pê anîbû ku insan bêbask, terempêl û balafir wê nikaribin bifirin. Gava Sarê jê re digot »Te çima şêxê me ji qesirê avêt?«
Dikeniya, »Min digo ka ez ê binerim bê ev insan çawa difirin! Wek teyran, wek çûkan wek ordekan difirin gelo!..« Lê mixabin piştî bûyerê hema bi çend rojekî, li xwe mikur tê ku Kenêr ew şandiye ser şêx.
Limêj dikir, lê limêja wî ne ji bo Xwedê, ji bo ebdan bû. Reketeke limêj bi sêniyeke birinc, du reket bi çar şekirên çayê, sê reket bi kulmeke mewîj, çar reket bi pariyekî goşt dikir. Destlimêjgirtin, niyetanîn û limêjkirina wî jî hemû evqask bû, »Xwedê qebûl bike, amîn.«
Xutbe bi çil zilamî dibû. Dîsa rojeke înê ye û Hûto di gundê Bamidê re
98

derbasî Eferê dibe. Zilamek ji xutba bamidiyan kêm e. Ji bo ku Xwedê xutba wan qebûl bikira, divabû hejmara wan bûba çil. Ji Hûto re li hev hatibû. Li ser hêkên elokê bazarê digirin. Hûto, »Sisê« ew »Dudu« dibêjin. Di dûmahîkê de herdu teref jî ji hev danaxwin û xutbe li erdê dimîne. Pîra wî Sarê bi vê liberxwedana wî pir kêfa xwe anîbû û pênc hêkên elokê jê re qelandibûn.
Heso:
»Erê erê, ji bo ku xanim li ser pira selatê li kêvir siwarê û tu jî bi dûvê wî bigirî, Xwedê ev qencî bi te kir ku qomandar pîra te ne kuşt.«
Kêr li Sarê disût û di nava xwe de dikeliya.
»Vê jinikê ez talan kirim! Birinc bi me ve ne hişt. Sibe, dusibe başçawîş bê mala me û bibîne ku me birinc jê re li êgir ne kiriye, em ê çi xweliyê li serê xwe bikin! Bi telaq başçawîşê tirek vê carê bi lêdanê wê min tirek bike...«

Heso carekê bi sedema ku birinc û goştê elokê ji başçawîş re çênekiribû, di mala xwe de ji destên wî du şiqam xwaribûn. Başçawîş jê re gotibû
»Her ku ez hatim mala te, tu ê ji min re goştê elokekê li ser birincê bikî û li ber min deynî. Eger hema rojekê ez bibihîzim ku te ji eskerê min re elok an mirîşk ser jê ne kiribe, ji xwe pêwîst nake ez ji te re bibêjim. Tu bi min dizanî bê ez çendî bêbav lawê bêbavan im!..«
Bi rastî li ser kiryara ku Sarê kiribû, Heso kirasê xwe biçiranda dîsa jî heqê wî bû. Ji tirsa ku başçawîş wî di mala wî de li pêş zar û zêçên wî pîs neke, nîv telîs birinc kirîbû û Sarê jî ew birinc hemû ji hevalbendên wî re li êgir kiribû. Lê gerek dîsa jî şikiriya xwe bianiya ku Sarê, ji dêvla elokan kavir ser jê kiribû. Eger elokên ku ji bo başçawîş bi qinê gwîzan xwedî dikirin, hemû ser jê kiribana wê çawa bûba! Gelo wê di şûna van elokan de ên wilo qelew, elokên kirînê li herêmê peyde bûbana? Başçawîş gotibû,
»Eloka ku ez bixwim divê qelew be. Goştê eloka qelew xweş e...«
Başçawîş ji lezeta goştê elokê fêm dikir. Ji ber ku zivistanan xwarina wî her tim elok bûn.
Dabaşa civatê li ser Hûto û xwarina wî bû. Lê Heso jî ketibû newala guman xeman, kûr û dûr difikirî. Xwarin nêvcî xwaribû. Sêniya xwarinê li aliyê malê vegerandibû û zikê xwe bi avê nepixandibû.
»Ma tu ne çû hin gundên derdor?«
Hûto bi xwarinê daketibû. Kengî deng diçûyê. Heso vê carê jî bi dengekî pêt:
»Lawê berêz Hûto, ez ji te re dibêjim!«
99
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Bibêje xalo bibêje, ma te çi got? Bi tirba bavê te kim xalo deng ne hat

min.«
»Ma tu ji qelêç danegeriya gundên derdor?«
»Belê xalo, ez dageriyam Atxê.«
Hemo xwe avêt nav gotinê keniya û bi qerf:
»Malneketo, tu çû heta bi Atxê ha!«
Heso dîsa bi qahr:
»Ma qey kafiristanî bû ku kesî bi xêra xwe gezek nan neda te! Tu wilo birçî ji gund bi rê kirin, ha!«
Hûto li bendî ku gepa xwe daqurtîne û dûv re wî bibersivîne ranewestiya. Bi dengekî hêdî di ber xwe de:
»Jina Şehabê atxî Fatimê tam pênc nanê tenûrê dabûn min« û bi lez lepê xwe di nav birincê rakir.
Miho keniya; kenê wî wek ên keçikên ku bi fitbolê dilistin, bi şîqe şîq bû. Bala civatê kişand. Wî guh neda wan û got:
»Lawo Hûto hinekî ji xwe fedî bike. Xwarin ji ber te nareve hêdî hêdî bixwe te em hetikandin! Baş e ku kesî xerîb di nav me de tune ye.«
Hûto nizanîbû derewan bike. Dema ku dikir jî dikeniya. Bi kenê xwe, xwe dida dest. Di ser kirina derewên wî re bi giştî rojek derbas ne dibû. Bi roj derew dikir û bi şev jî li xwe mikur dihat. Carina jî bêhnikek di ser re derbas ne dibû. Rojî ne digirt. Lê dema ku jê re digotin, »Ma tu bi rojî yî?« Wî jî digot »Erê« û bi şev jî di civatê de wê bigota »Min henekê xwe bi we kir, ez ne bi rojî bûm ha.« Li gor civata herêmê gelek prensîpên wî ên baş hebûn. Bêbextî ne dikir. Bêhnfireh, dilpaqij û sernerm bû. Zexelî li dor peyde ne dibû, mirovekî jêhatî û suxrekir bû. Eger ne ji Heso bûya, ew ê tu carî beşdarî pevçûnên gund ne bûya. Wî jî wek Sarê, Perîxanê, mamostê gund, Mîrzoyê mitirb û mele Salar aşitî dixwest.
Kenêr jê hez dikir. Bi haweyê ku bala civatê ji ser Hûto bikişîne û Hûto wek insên bi rehetî bikaribe xwarina xwe bixwe, bi dengekî têr axivî:

»Ey civat, gelo kesek ji we fikiriye gava ku em başçawîşê Sitilîlê bi vê pevçûna xwe a îro agahdar nekin, başçawîş wê çawa afatê bi serê me de bîne?« û bi serê xwe işareta zûxwarinê da Hûto.
Ev gotineke ne xweş bû. Bi gotina wî re firte firt bi Heso ket, mîna ku cerek av biherike bin, di cihê xwe de qeliqî û axîn kişand. Qasekî li bîn zikê xênî temaşe kir, serê xwe berda ber xwe, bi melûlî got:
»Îcar ev ne bû. Bi rastî me ev yeka ha ji bîr kiribû« û çavên xwe zîvirandin ser Hemo. Civat bêdeng bû.
100

Hûto bi kêf got:
»Xalê Şeytan, kuro hema ez destê te maçî bikim û hew! Erê willeehh!! Te heyfa min ji wan hilanî, lo! Gepek xwarin bê çi ye ne dihiştin ez bixwim kuro. De îcar bigirîn hi! Ji sibehê de henekê xwe bi aqilê min dikin. Û tu ji xwe re li aqilê wan binere. ku ne xalê min Şeytan heq ji we derkeve, ma kî dikare bi we!..«
Hûto tam ji dil digot û dikeniya.
Gundiyan ji Kenêr re »Apê Şeytan« û Hûto jî jê re »Xalê Şeytan« digot. Gundiyan gava jê dipirsî, »Tu çima wek me wî bi nav nakî?« Wî jî digot, »Xal ji apan çêtir in. Ap pîs in. Gava bavê mirov dimire, ap diya mirov li xwe mahr dikin. Lêbelê herçi xalin, vê bênamûsiyê qebûl nakin. Ji xwe fedî dikin ku diya mirov li xwe mahr bikin.« Li gor pîvanên wî, xweh çi bû jinbir jî ew bû.
Zibêr bi haweyê ku dora axavtinê revandibe ango niha neaxive wê hîç dor negihêyê, bi lez xwe da ser hev û got:
»Em û mala hûran ji bav û kalan de dijminên hev ên xwînê nin. Me bi sedan mêr ji hev kuştine. Û em ê hîn jî pir ji hev bikujin. Lê îcar a ku nakeve serê min, nizanim bê ev hûn çima ewqasî li himber eybê pîkolê

dikin. Me pêşiyan gotineke heye dibêjin, ‘Dijminayî bêminetî ye.’ Yanî dibêjin ku mirov çi di dijminê xwe de bike, ne eyb e. Di destê me de gelek delîl hene ku bi van delîlan em ê bikaribin Circîskê serşûtik û hevalên wî di qereqolan de bi lêdanê bikin kûçik lawê hezar kûçikî. Hûn çima gilîkirinê eyb dibînin? Eger gava bi muxbiriyê mirov wê bikaribe dijminê xwe birîn bike û ji vê yekê reviya muxbiriya wî ne kir, navê vê dibe tir-sonekî. Di berberiyê de eyb û fedî tune ye. Tu di dijminê xwe de çi bikî şeref e. Dijminayî bêminetî ye...«
Zibêr devê xwe tije kir ku bibêje, »Mirov gerek heta bi çîçika dijminê xwe jî bikuje!« Lê Sêdiq bi hêrs destê xwe hejand:
»Wî kurmancê ku gotiye, ‘Dijminayî bêminetî ye!’ bêşeref e! Bi bêşere-fiyê mirov bi şeref nabe; bêşerefî navê xwe her dîsa bêşerefî ye. Bi bafîka ku mirov dijminê xwe qels bixîne, mirov nabe muxbirçiyê eskerên qun-cilik. Wilehî xweş bazar e: Ji aliyekî de li meydana şer bi mêranî dijminê xwe bigevizîne û ji aliyekî de jî bibe muxbirçî ha! Wilo şeref nabe...«
Berî ku Hemo bersiva wî bide, Miho rabû ser kabokan, hêl da xwe ku ber bi Sadiq de bê. Ji bîr kiribû ku bêrîkên wî ên qapût tije birinc bû. Çawa hat, ji bêrîkan birinc bi nav şeqên wî de rijiya. Baş bû ku di tenişt Zibêr de rûniştîbû. Zibêr birinc ferq kir. Hişk bi çepilê wî girt.
101
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Bisekine! Xwedê ji te raziyo ma tu nabînî ku apê Heso diaxive, weh!« Herkes ji aliyê xwe de bi dengê bilind ji aş û baş diaxivî. Kesî rê ne dida kesî. Kê çi digot ê din nizanîbû ew çi dibêje. Mezinahiya Heso hatibû jibîrkirin. Ji bilî Hûto mîna dîkên elokan herkesî xwe dabû pêş û gotinên ji xwe mezintir dikirin. Ji van gotinên xwe jî pirole zewq distendin. Bêwestan çixare ji çixarê pêdixistin. Hindurê odê ji dixana çixara wan tarî

bûbû. Pace hemû girtîbûn lê derî vekirîbû. Ew jî ne ji ber dixanê, ji ber ku ji aliyê malê her kêlî çayê ji wan re dihat. Dixanê mîna konekî reş î bêsitûn xwe dabû jora wan, bin zikê xênî ji dixanê diyar ne dikir. Dema mirov ji der dihate hindur mîna ku mirov xwe bide ser bayê qulika qedemgehê, hilmeke pîs dida pozê mirov. Hemû ji destê goşt û tirşika fasûliyan kewişî bûn. Gelekan ji wan zêde zêde xawribû; zik li wan nepixîbû û ha ha fis dikirin. Destê wan ji axavtinê ne dibû ku çar, pênc deqîqeyan xwe dûrî civatê bigirin û destavekê bikin.
»Sadiq, lawê min tu her tim bi haweyê mêranî li meseleyan dinerî. Hinekî jî bi konebazî bifikire. Berberiya bêdek û dolab xwedîkuj e. Mirov wê him pêxember be û him jî berberiyê bike, wilo nabe. Berberî dîn û ûjdên nas nake. Di berberiyê de mirov li heq û hiqûq nagere, her-tiştî dide nav lingan û pê lê dikê.«
Sêdiq, mîna ku apê wî bi van gotinên xwe qebheteke mezin kiribe, ziq li Heso dinerî. Li ser hevdu hilm li çixara xwe xistin. Agirê çixarê giha tiliyan, çixare bi lez avêt hindama derî. Qutiya xwe a tûtinê bi hêlekê de û çeqmaq bi hêlekê de avêt. Keserek veda û bi xem got:
»Yanî apo tu dibêjî mirov bi bafîka ku dijminê xwe bide girtin, li ba sawcî û hakiman dikare derewan bike, telaqê xwe biavêje û destê xwe li Quranê xîne ha!«
»Erê erê. Ma îcar çi xem e qey lawê min.«
Bi haweyekî pirecêb:
»Batil batil, haho! Ma ne qaşo em misilman in. Mirovê misilman çima kirî bi derewan destê xwe li Quranê xîne; li ser navê Xwedê sund bixwe û telaqê xwe biavêje!«
Heso mîna ku henekê xwe pê bike, beşişî û serê xwe hejand:
»Kuro misilmanî ji xwe ev e. Wey xwelî li serê te be, bi jin û zarok e û hîn jî misilmanî nas ne kiriye. Pêxember sellellahûwessellem di Qurana

xwe de gotiye, xwîn bi xwînê. Mirovê ku zilm li te kir, tu jî zilmê lê bike, ne guneh e. Mirovê ku li ba çawîş û mawîş û hakim û makiman bi derewan bextê xwe avêt, bi Quran û telaqê jinberdanê sûnd xwar, tu jî tam
102

wek wî bike, ne guneh e. Ev gotinên pêxemberê me ne, sellellahû eleyhî wesellem. Qe em ji pêxember ne mezintir in. Em ebdên wî ne. Em mecbûr in bi a wî bikin...«
Zibêr piştî ku dît Heso jî wek wî li def û zirnê dixîne û Sêdiq neheq dike, bi aqilê Sadiq keniya û xwe nepixand. Ne hişt ku Heso peyva xwe biqedîne, eniya xwe xurand û serê xwe wek ê jojî bi wê navê de dirêj kir.
»Hûn hîn naşî ne. Temenê me di berberiyê de çû. Me ev porê xwe li ber dar û deviyan sipî ne kiriye, birako. Berberî li ser esasê fen û fûtan dimeşe.
Dinya bi xwe, wilo ava bûye. Tacirê gava nizanibe derewan bike, nikare bibe tacir. Di berberiyê de telaqreşî û bêbextî şertê herî mezin e. Çimkî berberî siyaset e. Û siyaset jî vîlikgerî ye. Heft, heyşt seetên me çêbûn ku bi devjengê me daye ber hev û em çêlî tiştên beredayî dikin. Ev çi aqil e! Pêşiyan bi derewan ne gotine, 'Ê ku ku...a kera te, divê tu jî biku...î çêleka wî, da qatix li ber biherime û nema bikaribe şîr û mastê wê bixwe!'
Hişê xwe qenc werînin serê xwe, rabin da em biçin gilî. Eger em neçin gilî û xwe ji insafa şeref û namûsa ku Sadiq efendî neh, deh seete serê me pê mijûl kiriye re berdin, Circîsê qûnreş wê biçe gilî. Circîsko mirovek ji me bi demaçê birîn kiriye; ev firseteke bi şîr û şekir e ji bo me. Pêşiyên me dibêjin ku...«
Xwest bibêje, »Cihê ku destê te herêyê lingên xwe jî têxêyê«, lê Sadiq peyva wî birî. Destê xwe avêt bêrîka xwe sed wereqe derxist û li ber rûnişt:

»Ma van pêşiyên me qe hîç gotineke baş ne gotiye, çi qewimî yasitar! Te pêşiyên kurmancan hemû rezîl kirin. Bi tenê hema gotinekê bi qencî ji devê wan bextreşan bibêje, eger min ev sed wereqe neda te, bila ez lawê berêz bim!«
Zibêr keniya û li pereyan nerî. Devê wî bihustekê ji ser hev çû. Diranên wî ên pêşî, mû ji ên keroşkê bernedabûn. Hewl da xwe ku gotineke baş bibêje, Kenêr awir tê firand. Wî pala xwe da dîwêr û dîsa li Kenêr nerî. Lê Kenêr jî awir hîn dijwartir kir.
»Hi, i, erê lo, pêşiyên me tiştekî baş ne kirine heta ku gotinên wan jî baş bin. Na na, pêşiyên me gotinên xerab ne gotine ku tu xwe ewqasî zivêr dikî Sadiq! Gotinên wan hemû ji Quranê ne yanî« û herdu destên xwe dirêjî paşila xwe kirin.
Paşil dixuriya. Goştê ku xistibû paşilê bi ser tazî de berdabû. Goşt ji germa canê wî mixmixî û mizeloqî bûbû. Dohn xwe bi nav pirçê de berdabû, pirç û goşt mîna rês li hev pêçabû. Sipî bi bêhna tewêş har û degel bûbûn. Xwe ji ber kevîkên dirûnê bi ser lêş de berdabûn û bi lez di-

geriyan. Canê wî bi dijwarî gez dikirin. Herwiha xwe dixurand û di cihê xwe de bêwestan diqeliqî. Di dawiyê de xwe ne girt.
»De ka ji kerema xwe re hinekî raweste Sadiq, ez ê herim avekê birjînim û dûv re bêm tiştekî ji te re bibêjim« û bi lez ji odê derket.
»Heso ez jî dibêjim me ne baş kir. Gerek me gilî kiriba. Di vir de kêmaniya me a herî mezin ku ji sibeha Xwedê de heta niha, çima em bi xwe şiyar ne bûne û herwilo em pûç û vala peyivîne.«
»Tu çi dibêjî Xelef? Em çima pûç û vala peyivîne?«
Xelef bêî ku li tiştekî binere, qasekî çavên xwe kutkutandin û bi mi-

jankên xwe lîst. Palika çavê wî ê çepê dixuriya. Lê wî eniya xwe xurand.
»Ma ne çima! Me du tiştên ku bi temamî ji hev cihê bûn têkilhev kirine û em li ser peyivîne. Gilîkirin tiştek e û muxbirî tiştek e. Bi giliyê ku em di neyarê xwe de bikin, em nabin muxbirçî. Em ê di tiving û demaçên wan hilnedin, lê em ê bibêjin ku bi sîlehan êrîşî ser me kirine. Gelî civatê ma ne wek min e, hûn bi qedirê Xwedê kin lo? Ma we ev fikira min çawa dît?«
Heso çavên xwe li ser civatê gerandin. Civat di bin simbêlan re bi gotina Xelef dikeniya. Herkesî dixwest bi qerefekê wî bibersivîne. Lê ji ber ku ew jî bi qasî Heso yextiyar bû, newêrîbûn. Çavên hemiyan li ser Sêdiq bû ku ew hema devê xwe veke, pirqînî li wan keve û serbest bikaribin bikenin. Sadiq devê xwe tije kir ku bibêje, »Heft çîrokên hirçê hebûn û herheft jî li ser dareke hirmiyan bû...« Heso berî wî, bi qahr got:
»Heh, bê çi aqilmendekî mezin e! Aqilê wî pola dibire pola!« û li Hemo nerî.
»Ma tu çi dibêjî yabo qurbano? Aqil ji aqilan çêtir heye. Em hemû îro xurifî ne, kesek ji me tiştekî ji tiştekî dernaxîne. Wilehilezîm çiftî ji ber me tê. Xezebek li pêşiya vî gundî heye bê bêlome be! Îcar hema Xwedê bike ev xezeb li mala Circîsko biqelibe!« Destê xwe ber bi Xelef de vekir û gotina xwe domand:
»Mêro qaşo aqil dide me, hi. Em ê gilî bikin û bibêjin ku wan him sîleh berdane me û him jî sîlehên wan tune ne. Felekê neheqî li te kiriye ku tu ne kiriyî siltanê welêt. Hemo, de ka li tûrikê xwe binere, belkî tiştekî xêrê tê de hebe. Serê min nema çerx dike, we ez tê de teqinandim...«
Di vê hingamê de xortek ket derî. Lawê Zibêr bû.
»Apê Şeytan, mîha we şevder maye. Jinapa min Kejê got ku bila here lê bigere.«
Da xwe ku rabe, Heso ne hişt. Ji qazî ve rabû ser xwe, kengî diçû. Destê

wî ji fesadiyê ne dibû. Ji bo wî fesadî, ji liqûmên Diyarbekirê jî xweştir bû. Jina wî bi malê xwe dizanîbû ku ew ê neyê. Pênc deqîqe ne ketin wê navê, ew bi xwe hat.
»Kuro, rîha te di vê fesadiyê de sipî bû, bes e bes! Zaroyên zaroyên te çêbûn, hey Xwedê ezman bi ser de xisto! Şeytan bû te zoriya wî jî bir! Erê tu doza çi li ometa Mihemed dikî, hey gura pezkuşto! Sê mîhên me hene; yek virikî bûye, yek bi zerdikê ketiye, yek şevder maye û tu jî li vê derê agir
dipijiqînî melayiketan!..«
Kejê pîrekeke dirêj, dagirtî, esmer û xwînşêrîn bû. Wek Sarê henekçî û limêjkir jî bû. Ji çîmê xwe ê çepê dikuliya. Çîm bawî bûbû. Di mehên bi-har û havînê de salê neh, deh caran diçû ziyareta Girnewas. Li ser gir şevekê, du şevan radiza û due dikirin. Lê mixabin her ku bi wir de diçû, çîmê wê hîn xerabtir dibû. Gundiyan qerfên xwe pê dikirin:
»Pîra Kejê, eger tu ne jina apê me Şeytên ba, wê xalê me Girnewas tu di deqîqeyekê de rehet kiriba. Ew mîrê cina ye û ê me jî serekê temamê melaka ye. Mêrik ji Şeytên newêre destê xwe dirêjî te bike. Mahra wî ji ser xwe rake, tu ê bibînî bê wê xalê me Girnewas çawa devê xwe têxe birî-
na çîmê te...«
Ew jî dikeniya:
»Yabo eger mesele ev be, hema em ê şevekê bibin jina mîrê cinan jî, ma wê çi bibe qey. Şeytanê we, bi qasî fesadiya xwe ji min hez dike... Îcar şe-va ku min xwe xist bin mîr û mîr jî bazda ser min, bila ew jî bifire ezmên û bi melayiketan re şer bike...«
Pênc law û sê qîzên wê hebûn. Sê lawên wê mû ji bavê xwe berned-

abûn. Pîrê li xwe dixist, digiriya û digot »Bavê we şeytan û hûn jî sê şeytan, ev dinya wê çawa bikaribe barê we hilgire! Xwedê ometa Mihemed ji we bisitirîne!..« nifir li wan dikir û berzûrî Xwedê dibû.
»Keçê Pîrê te ez hetikandim, temam bimeşe ez va hatim!« û bi rastî vê carê rabû ser xwe.
Heso ruyê xwe tirş kir:
»Bibêje û dûv re here!«
Kenêr li ser pêyan got:
»Ji serî de ez hevalê gilî bûm. Û min ji te re got. Te xwe ji bîr kir û min jî newêrîbû deng bikira. Bûye şev, ez ê ji niha pê ve çi bibêjim? Ez bawer nakim ku himberên me jî wek me bêaqil fikirîbin« û meşiya.
Heso fêm kir bê Kenêr çi got. Ji cihê xwe çeng bû:
»Bi telaqê jinberdanê Circîsko em xapandin! Tu rast dibêjî. Wî bîr bir

û me bîr nebir, wax li vê ecêbê! Gava bi roj xwe ji gund berdabûya, me ê bizanîbûya ku diçe gilî. Yarê gonê xwe li bendî şevê hişt. Bi şêxê li erdê Bexdayê niha li ba mêrik di temenêde ye. Ez zilamê xwe nas dikim bê, çi dol e.«
Dîsa civatê baş fêm ne kir ku Kenêr çi gotiye.
Miho xwe ne girt:
»Apê Heso, ma apê Şeytan ji te re çi got?«
»Got ku Circîs niha li qereqolê ye û giliyê me dike. Û em jî ji hev re çîrokan dibêjin...«
Zibêr bi hinc destê xwe li kulêv xist, toz bi ser çavên wî de bilind bû.
»Pêşiyên me bi derewan ne gotine,’bêhna fireh ji qelsayê tê!’ Ji bo gilîkirinê mû bi serê zimanê me ve şîn hat, lê te bi a me ne kir, apê mino.

Bi rastî ez îro tiştekî ji te fêm nakim, tu pir bêhnfireh xuya yî. Ma qey tu me qels dibînî?«
Destê xwe ber bi Hûto û Luqmên de vekir û peyv domand:
»Hindur ji dêwan dagirtiye. Mîna dêwên me çend dêw di malbata hûran de hene gelo ku tu van teyran li me çêdikî? Dev ji taswasê berde. Tu ji çi ditirsî malneketo?..«
Vê carê jî rabû ser xwe, ber bi deriyê odê de meşiya û destê xwe hejand:
»Bi tenê hema bibêje 'erê', emir bike û te jê tune be! Bi telaq ez ê rahijim devziravê û ketûber li hemiyan bireşînim! Ez ê bikujim û bikujim heta ku tenterûs sax ji wan nemîne!..«
Hemo bi Zibêr ve rabû û bi çepilê wî girt.
»De ka were rûne Xwedê ji te razî. Tu gelekî kelgerm î. Bavo mirov karan dike, lê ne bi temtêla te...«
Zibêr rûnişt. Minêkarbû rûne. Ji bilî Hemo, kesî ew cidî ne girt. Civatê pê dizanîbû ku zirçonekî zilaman e. Dîwarê ku bi gotinan lê kiribû ji dûr ve delal diyar dikir, lê qelşên dîwaran fireh berdabûn, da ku di van qelşan re bi hêsanî bikariba ferşik berdana. Ji aliyekî de hewl dida kevirên bijarte ku dîwar sipehî xuya bike û ji aliyekî de jî bi cebleke şilek dîwar diseyand. Eger Hemo ew nedaba rûniştandin, ew ê dîsa jî rûnişta. Di derî re berdayê ew ê di şibakê re bihata. Eger ode bêderî û şibakebana, miheqeq dê dîsa jî rêyek ji xwe re dîtiba. Heraqê fesadiyê bû. Çêvên wî ên zerdoqî di nava serî de dilîstin. Bi hesabê avrijandinê goşt di nav keviran de veşartibû û karê xwe tebût kiribû. Sipiyên berî niha ew nema gez dikirin. Tu sebeb jê re tune bû ku rûnenişta.
Xelef ji nişkê ve destê xwe bilind kir:
106

»Ji sibehê de ez li civatê guhdar dikim. Di vê civatê de ê ku herî hindik

peyiviye yek jê ez im. Bi rastî, Zibêr mirovekî berberçî ye û ji berberiyê jî baş fêm dike. Gerek ji serî de me bi a wî kiriba.«
Zibêr pala xwe tam da dîwêr û destê xwe hejand:
»Erê, pêşiyên me bi derewan ne gotine, 'Eger aqilê qûnê heba, wê tir ne kiriba.' Em bêaqil in« û li Sêdiq nerî.
Gotina wî li hesabê Miho hat.
»Wey devê te tije şekir be Zibêr lo, tu pir xweş dibêjî! Bi serê bavê xwe kim îşev tu tam dihilînî ha! Lawo tu wek aliman dipeyivî.«
Sadiq bi xwe ne xweş anî. Bi dengekî pêt got:
Miho, tu çi wek wan dîkên ku ji pevçûnê direvin bin kirasê pîrekan û di bin kirês de dixutxutînin, te xwe xistiyê berpala Nûrî! Rabe li qûn rûne û bipeyive ku em hinekî aqil ji te bigirin. Civat hewcedarê şîretên te ye« û berê xwe da Hûto:
»Ma ne wilo ye Hûto?«
Berî ku Hûto wî bibersivîne, bi lez li seeta xwe nerî. Lingê xwe ê rastê bi şid li erdê xist û bi qahr got:
»Hoooweh li vê ecêbê, ji destê Circîsko, em ji sitiranên pişka kurdî jî man! Îşev wê Meyremxanê sitiraba...«
Hûto li hindama derî neh, deh şekal li hev kom kiribûn, li ser wan rûniştibû û nenûkên xwe dikoja. Mîna ku di civatê de ne rûniştîbe, xwe bi xwe geh dikeniya û geh jî bi Sarê re li ser kavirê ku ser jê kiribû diaxivî.
»Te got çi Sadiq?«
»Miho dibêje ku Zibêr dişibe şêx û melan, ma rast e?«
»Na ne rast e, Zibêr dişibe goşt û Miho jî dişibe tirşikê.«
Civat hemû keniya û heryekî tiştek got.
Sadiq bi serê bêvila xwe peyivî:
»Zibêr û Miho, kuro hayê we ji we hebe, wileh ev zilam îşev dikare we bixwe...« Ew hîn wilo diaxivî, jina Hûto bi teşteke girar ket hindur.

»Hûto, min ji te re girar, hêkên qelandî û kîsikek şekirê hûr ê çayê aniye«
Hûto bêhnçikyayî pê ve rabû û teşt ji destê wê girt. Piştî ku got:
»Keçê Hitê eferim lê!« xwe dada hêkan û bi yektûşê re hêk dabelihandin.
Hitê, deh hêk qursikî qelandibûn û li ser girarê kiribûn. Girar bi hêkan nixumandibû. Hûto piştî ku hêk hemû xwarin û kîsikê şekir vala kir nav satila avê, devliken peyivî:

»Keçê girara xwe bibe û zû here malê!« û nehişî kişiya ser avê.
Civat ji ken li piştê rast bûbû. Lê herçi Hûto bû ji xwe hîç ne xema wî bû. Wî bi keft û lepta xwe ji civatê û civatê jî ji wî zewq distend. Li gor civatê, ew mirovekî dahbe bû. Lê li gor wî îcar, him benda pizûran û him jî penda hûran herdu jî zir ehmeq bûn. Wî bi haweyekî din li jiyanê temaşe dikir û digot:
»Jiyan jin e, xwarin e, ger e, nêçîr û lîstika bi kûçikan re ye. Axx! Ma ku nozdeh jinên min ên wek nozdeh dîwaran wilo bi qelafet hebana û bi zikê têr her şev min bazda ser yekê wê çi bûba qey! Kuro ev Xwedê jî bi rastî mirovekî pir ecêb e lo, ez bi qasî girekî mezin û Hitikê jî bi qasî kizinekê hûr xuliqandiye! Îcar Xwedêko, tew bi ser halan de ew kizin xistiye bin vî zir girê ha jî! Hûn bi qedirê xwedê kin, ma niha ev jî ûjdan e hi!..«
Seet bûbû dehê şevê. Û şevbihêrk hîn jî belav ne bûbû. Ji bilî rojên pevçûnan, şevbihêrk bi giştî seet li dor nehan belav dibû. Zoravî zû radiketin û zû jî radibûn. Di rastiya xwe de xelkê herêmê hemû jî mîna zoraviyan zû radiketin. Pizûriyan bi destpêka komcivîna xwe re, pêşî, tibabekî dirêj bi devjengê li hev sor kirin. Devjenga wan jî pir tirovirî bû.

Heryekî bi gerevêre ji xwe re tiştek digot. Kesî li kesî guhdar ne dikir. Dûv re bêî ku bi xwe bizanibin hêdî hêdî bêhemd, devjeng serguherî mêr û mêraniyê kirin. Xwe wek teyrên baz, dijminên xwe wek mirîşkan dîtin û di wan re firiyan. Teyran kirin şîqe şîq, bi hewa de gur dan xwe û mirîşk ber bi koxik û kadînan de ajotin. Ne xew û westan, ne dîn û ûjdan û ne jî xwedê û pêxemberê ku jê re îbadet dikirin di bîra kesekî de dihat. Herkesî dixwest her tim dora axavtinê a wî be, ji wî pê ve kesek neaxive û
ew jî herwiha postê dijminê xwe tije pûş bike û dûv re jî agir berdêyê. Qirêja binê zemanan bi ser mejiyê hev de berdidan û bi kîn hevdu radikirin serserê silûmên çiyayan; wek şêr û pilingan xwe dadidan hev û ber bi newalên bêbinî de digindirîn. Keleman canê wan qul dikir xwîn dipijiqî. Lê ne bi êşa canê xwe agahar dibûn û ne jî ew xwîna gevez didîtin. Rehê mêraniyê di eniya wan de bel bûbûn, agir ji devê wan diçû. Hemû jî heraqên berberiyê bûn. Ji fesadiyê, gotinên genî û zirtekiyê heşkere zewq distendin. Ji xêrê gotinek ji devê kesî dernediket. Soba odê bi qasî şikerekê mezin bû, êzing li ber bûn û zivistan bû. Lê wan ew zir so-ba ha ne didît heta ku agirekî ji xwe re bikin.
»Ê ne dîtin û gotin nabe wek hev, ê ne we nedît bê min çi kambaxî bi Feremezko de anî! Min tam ew di qorziya xênî de zeft kiribû, min serê wî xistibû nav şeqên xwe û kulm li ser kulmê li qerpika devê wî dixist. Ji ber
108

kulmên min digiriya. Lawê tirekê xwe diavêt bextê min, hi.«
Casimê ku darek ji çena xwe xwaribû û çena wî wek qoqekî ta werimî bû, ji dera ha rabû ser kaban.
»Apê Sufyan hema te bext dabayê wê çi bûba qey. Mêrê ku teslîm bû mirov lênaxe.«

»Hûn hîn zarok in, tahma şîr ji devê we tê. Çi dibêjin pêşiyên me? ‘Ku te girt bernede û ku te berda jî bi dû nekeve.’ Min ew girtibû carekê. Ma çêdibû ku min hitka wî daneda û ew wilo qûnziwa berda ha!«
Heso mîna ku ji dil bikene, kenekî beloq kir.
»Ebû Sufyan vê carê ne bû, te ev gotina pêşiyan çewt tefsîr kir...«
Sadiq ne dipeyivî. Xewa wî dihat. Serê wî jî şikestibû. Di vê navberê de jî Hemo bêî ku bala civatê bikişîne ser xwe, pişta situyê xwe bi hêdî hêdî difirkand. Ridwên debûz avêtibû serê wî, lê li pişta sitû ketibû. Damarên situyê wî li hev geriya bûn sitû nepişî bû, bi zor li çep û rastê xwe dinerî. Ji bo ku kesek vî aliyê wî ferq neke, pir zor dida xwe heta ku situyê xwe dizîvirand. Di dawiyê de xwe ne girt, ne hişt ku Heso peyva xwe biqedîne.
»Dema ku min demaçe ji qewlik kişand, Circîsko ev lepta min dît û bi yekbêhnê bazda hindur. Yarê gonê fêm kiribû ku ez ê wî bikujim. Bi rastî min ji dil du fîşek li ser kirin, lê bêbavo ji gulên demaçê xurtir diçû...«
Xelefê ku bi derba destîbivirê Sebrî li erdê veziliyabû û ji kulîmeka xwe a çepê wek kamyonên Anter vêl diçû, dest pê kir:
»Xwezîka ji xêra mala Xwedê re we dîtiba û hew! Min kevirekî yeklepî li termaza Sebrîko xist. Lawê yadika xwe di bin derba kevirê min de mî-na rewtekî tewiya û dawiyê jî xwe li ser lingan ne girt û li erdê veziliya. Lêbelê ew di wê rewşê de û min kevirekî din jî pê ve zeliqand. Nema deng jê hat. Eger miribe baş e û eger ne miribe ji xwe segbavo tu carî nema dimire...«
Xelef dixwest lingên xwe bi lingên mêrxasên civatê re rada. Lê heq jê dernediket. Nizanîbû ku derew bi xwe hinereke, herkes nikare derewan bike. Civat bi derewên xwe dihisand û xwe li keleman diqeliband. Sebrî mirovekî sih salî û ew jî şêstsalî bû. Di tayê wî de Necîm hebû. Eger derewên xwe di biwara Necîm de bigotana, belkî civatê jê bawer bikira û

di bin simbêlan re ewqasî pê ne keniyaba.
»Bi rastî heta niha min nizanîbû ku Luqman di pevçûnê de ewqasî jêhatî bû. Min bi çavên serê xwe ew dît. Kevirên wî fût ne diçûn, yekederb hûrî li erdê vedizilandin. Eger zaroyên Circîsko dest neavêtina

demaçan, bi telaq Luqmên wê yek ji wan sax bernedaba! Bala min kişand, nizanim hûn jî bi wî dengî hisiyan gelo? Dema ku Luqman kevir li serê Haco xist, dengê reqîniya kevirê wî di felekan re derket! Ecêbnedîno qahfûrê serê insên çiqasî qewîn e, wey bavo!«
Luqmên xwe nepixand û di bersiva ev ê serşikestî de got û got:
»Ma ez biraziyê kê me apê Selîm! Te heta niha ez çawa didîtim qey! Bila Hesûk duekarê wê dayika xwe be û hew. Eger ne ji ew a fiqirpîs ba, ma min yek ji wan li ser lingan dihişt, weh!..«
Luqman digel wê dengbêjiya xwe a hêja, zirçonekî zilaman jî bû. Carina teyb datanî ber xwe û kaseta Bişarê Çeto, Hemê Gozê û Elîyê Betê datanî ser. Li ber dengê teybê dihat eşqê, ji ser xwe diçû, xwe wek Hemê Gozê didît û bi navtêdanan diqêriya. Carekê ronîvro rahişt tivinga xwe, hilkişiya çiyê. Piştî ku çarhawêrî xwe kozik û çeper danîn, Bişarê Çeto û tabûreke esker di van kozikan de bi cih kir û bi tivingê ji vê kozikê avête kozika din. Ji kozikên vala helbet wê deng ne hatiba. Lê wî rêya wê jî dîtibû. Di vê gava ku wî ev şerê wilo çetîn dikir, ji kozika himber xwe, hişt ku Bişarê Çeto gazî wî bike:
»Hemê Gozê tu mêrekî nesêle yî, were rayê...«
Di bersiva Bişarê Çeto de xwe bi xwe dîsa wî got:
»Ez Hemê me, Hemê Gozê me, kilê çavê Sirmê me...« û êrîşî ser kozika Bişar kir. Li gor sitranê, Hemê Bişar ne kuştibû. Lê wî di kozikê de

Bişar dabû ber xenceran û çend cendekên generalan jî bi ser de qulipandibûn.
Carekê jî li ber sitrana şerê Şêx Mahmûd ku Kawîs Axa digot, hate eşqê. Şeveke havînê ye. Zilamên pizûriyan li ser oda Heso rûniştîne û şevbihêrkê dikin. Temo radyoya kurdî vedike. Kawîs Axa distirê. Luqman moca radyoyê heta bi niqra dawî dizîvirîne û herdu guhên xwe bi ser radyoyê de miç dike:
»De loyloy, de loylo, şerekî qewimî li çiyayê Kermanşê li derî Wanê. Şêx Mahmûd kekê Şêx Hadî bavê Nezîr... hewara kurd xayino!..«
Luqman li sênga xwe xist, »Tubb tubb, xwe bigirin ez têm hewara we ...« û xwe ji ser xênî avêt erdê. Bêî ku rahije tivingê, bi bazdan berê xwe da
qereqola hidûd.
Heso:
»Kuro Hûto bide ser piştê, lawê qahpikê çû çû! Wî zeft bike kuro!..«
Sarê jî bi ken:
»Heçê wî bigire ez kîrê wî di jina wan kim! Kuro Heso, bihêle bihêle bi-
110

la here, belkî ruyê vê mentîqa bênamûs li ser destê me sipî bibe. Bihêle bi-
la çend qûncilikan bikuje!..« Lê mixabin gava Sarê wilo diaxivî, Hûto ji zû de dabû dû lawê wê û ew zeft jî kiribû. Eger Hûto ji serî de dengê Sarê kiriba, belkî bi dû lawê wê ne ketiba û hertişt wek ku wê dixwest encam daba. Mirovê ku bikarîba Luqman zeft kiriba, di nav temamê gundiyan de tune bû. Luqman dêw bû, lê Hûto jî dêwê heftserî bû. Bi tenê Hûto, heq ji Luqmên derdiket.
Civat sist bûbû. Hilma xewê avêtibû ser çavên wan, yek yek diçûn mala

xwe. Sîrac, Hûto û Meshûd ji zû de şevbihêrk terk kiribûn û li malê ketibûn xewa şêrîn.
Di vê civatê de, ên ku herî hindik peyivîbûn Kerîm û Xelef bûn.
»Kerîmo, de ka tu tiştekî bibêje, tu hîç ne peyivî. Tu îro dîsa ne di nav şer de bû...«
Miho gotina Sadiq birî.
»Belkî dîsa raza bû.«
Sadiq:
»Ma te ev şerê me ê îro, şevê din di xew de ne dîtibû ku te ji me re ne got, lo? Te me pê agahdar kiriba, me ê haziriya xwe kiriba Xwedê ji te re razî be.«
»Min şer ne dît, lê min tiştekî ji şer mezintir dît.«
»Xwedê xêr bike, çi bû gidî!«
»Min dît ku birûsk li xaniyê Circîs diket, xanî bi ser hemiyan de diher-ifî û hemû dimirin.«
Gotina wî bi temamê civatê xweş hat. Keniyan. Zibêr bi kenê xwe li hemiyan ferq kir û rabû ser kaban:
»Lawo ev çi xewneke delal bû! Wey hema Xwedê vê xewna te, hezar carî qebûl bike!..«
Kerîm fitneyî ne dikir. Mirovekî xeyalperest û ewqasî jî henûn bû.
Heta ku ji destê wî dihat, beşdarî pevçûnan ne dibû. Heyşt salan »ilk okul« xwendibû. Ji rastiya jiyanê bêtir li gor xewnê dimeşiya. Wî navê gelek serokên welatan dizanîbû. Di xewnê de didît û bi ro jî li tiştê ku dîtibû digeriya. Şevekê di xewna xwe de Robert Kennedî dibîne û xwe berdide ser rêya Îpekê ku here Emerîkayê. Kennedî ew dawetî Emerîkayê kiribû. Îcar baş bû ku jina wî zû bi çûna wî dihise. Xeberê dide Heso ku Kerîm li ser rêya Îpekê ye û ew ê bi derinan de here. Heso û Kenêr xwe kar dikin. Kenêr bi dû de diçe Nisêbînê û Heso jî diçe Mêrdînê. Kenêr

Kerîm li Cizîra Botan zeft dike û wî vedigerîne malê. Jina Kerîm dev ji
111
karê xwe ê malê berdabû û herwiha bi dû mêrê xwe de digeriya. Carina bêî ku Heso çûba Nisêbînê an Mêrdînê, Kerîm di civatê de jê re digot,
»Tu bi xêrhatî Apê Heso, ma li Nisêbînê îro çi hebû?«
Civata Heso bêpêjin sekinî û guh da ser hewşê.
»Malê malê, jinapa Sarê, de ka werin derî ji min re vekin«, dengê mamostê gund Erol ji pişt deriyê hewşê dihat.
Sadiq ji cihê xwe rimekê bilind bû; « Wey kuro ev dengê mahelimê me ye« got û bi bazdan ji odê derket.
Sarê ji wahca nava xwe re ne hatibû civatê. Li ser sicada xwe rûniştibû selewat dikişandin û due dikirin. Bi hatina mamoste re xewê ji ser çavê civatê avêt. Herkesî xêrhatin di mamoste da û guhên xwe bi ser de miç kirin. Hemiyan jî dizanîbû ku ev mirovê ha bi armanca xêrxwaziyekê di nav wan de bike, hatiye şevbihêrkê. Ew gelek caran bi vî karê wiha rabûbû. Zibêr ji mereqan hinavên xwe dixwarin. Rabûbû ser kaban û bêsebir li devê mamoste dinerî.
»Xwedê xêr bike mahelimê delal, vê nîvşeva ha çi hewal li te qewimiye gelo?«
Heso birhûyên xwe hildan û bi haweyê ku erza Zibêr bişikîne, awir tê vedan.
»Xwedê ji te raziyo hinekî giran be giran! Bihêle bila mêrik bêhna xwe berde, weh! Qe ne teyr e, bifire. Çi di bin de hebe wê ji me re bibêje. Temo çayeke giran ji vî mêvanê me ê ezîz re bîne...«
Sadiq çixarek da dest mamoste û çeqmaq li ber pêxist. Mamoste hilmeke dirêj kişand, devê wî di nav dixanê de winda bû. Mîna ku bêisûliyek kiribe, serê xwe berda ber xwe û hêdî hêdî dixan berda. Dixanê ji navikê û berjor de xwe lê pêça û bi hemd bilind bû.

Gava Sarê ew dît, bi kêf got:
»Weyla, ji xwe re lê binerin bê kî hatiye kuro! Wey tu ji wir û heta bi vir di ser herdu çavên min re hatiye, ey mêvanê delal!«
Mamoste ji ber Sarê rabû ser xwe.
»Herdu çavên te di nav nûrê de bimînin, ez têm destê te. De ka were li kêleka min rûne, pîrika min a delal. Sê roj çêbûn ku min tu ne dîtiye. Bi rastî min bêriya sohbeta te kiribû...«
Sarê li tenişt Sêdiq rûnişt. Hûçikên xwe hildan. Li mamoste nerî, destê xwe li ser civatê gerand û got:
»Ez bi qurban, dev ji vî miletê xerabe berde. Li xêrê tiştek ji van der-nakeve. Xwedê me ji xezaba wan bisitirîne. Zikê hemiyan ji fitne û fe-
112

sadiyê bûye teniya binê beroşê. Wek araqvexwiran nehişî bûne, kesek ji wan nizane bê çidike. Kulibî ne, xurifî ne! Lê îcar binere, bê tu zarokên me bi aqil nakî. Dev ji zilaman berde, bi zarokan dakeve...«
Te digot qey civatê zimanê xwe daqurtandibû, herkes di cihê xwe de bêdeng sekinîbû û li pîrê guhdarî dikir. Mamoste di dilê xwe de digot:
»Ez heyrana cesareta te me. Insaniyet bi ên wek te li ser pêyan disekine. Eger ne ji te ba, wê ev gund ji zû de wêran bûbûya. Xwezîka tu mezinê dewleta Tirkiyê ba. Belkî bi saya serê te, em tirk jî bûbana insan û me zilm li we kurdan ne kiriba û kurd û tirk wek biran bi hev re jiyabana. Kî dizane belkî wê demê em tirk jî, bi qeweta kurdan careke din bûbana mezinê dinyayê. Em zilmê li we dikin. Ez ji xwe fedî dikim ku ez tirk im! Lêbelê pîrê, mîna we kurdan ên xerab û ên qenc di me de jî hene. Ez hêvî dikim ku tu, me ji hev cihê bike...«
Heso bi haweyekî devli
ken:

»Lêlê pîrê, bes e bes, te eyarê me tije pûş kir!«
»Çima bes e pîro! Ji sibeha Xwedê de hûn dipeyivin û kesî ji we re ne got, hûn çima dipeyivin. Ma qey ez ji Eyşika Ereb im, ez ê jî çend gotinan bibêjim da bêhna min derkeve...«
Heso hîn bêtir keniya:
»Keçê niha ne hewara bêhn derketinê ye, li cihê xwe rûne. Ji xwe re li aqilê wê binerin kuro, ku dibêje ez ê 'bêhna xwe berdim'. Ma me çi safî kiriye heta ku tu bêhna xwe berdî. Ka bise, em hevdu baş biçirînin û dûv re bêhna xwe li me berde. Ma te got çi jina min?«
Pirqînî li civatê ket, herkes keniya. Sarê gava ku Heso jê re digot »Jina min«, xwe aciz dikir û li Heso tam sor dibû.
Sarê bi hêrs:
»Ez li cihê xwe rûniştî me Heso beg! Ez jina te me yanî çi! Xwedê, dikarîbû tu jî bikira jina min, ma ne ji xwe. Bibêjin bibêjin, hevdu biçirînin, bipeqînîn, Xwedê bike ku yek ji we bi kêr ê din bi penêr be!« û bi qahr li Zibêr nerî.
Zibêr serê xwe berda ber xwe û bi lez qutiya tûtinê vekir.
»Jinapa me Sarê rast dibêje. Bi rastî em nizanin bê em doza çi li hev dikin. Kalik û malikên me du sed, sê sed sal berê li ser hûr û pizûrê xezalekê hevdu dikujin. Erê lo, ma dibe ku mirov li ser tiştên wilo beredayî hîn jî bi hev re berberiyê bike. Dewra heywên çû. Îro dewra terempêl û teyaran e. Heydê em ê bibêjin di dema wan de belkî hûr û pizûr bi qîmet

bûn, lê îro sûka Nisêbîne tije hûr û pizûr û serûpê ne. Wê rojê min ji qesapxanê hûr û pizûrên zir gayekî bi sê wereqeyan kirî«
Xwest ku bibêje, »Min serê gê jî bi mecîdiyekî kirî«, Sêdiq zendê Sarê

niqurçand:
»Zibêr, bi telaq ya tu ê bihêlî Erol efendî bipeyive û ya jî ez ê nehêlim ku tu serê gê bikirî. Te hûr û pizûr kirîn, me deng ne kir. Bû dereng, şev qariya. Civat dixwaze belav bibe. Bihêle ku Erol efendî çend gotinan ji me re bibêje.«
Sadiq bi Zibêr dizanîbû ku derewan dike. Hûr û pizûr ne kirîbûn.
Gotin di cih de qut kir.
»Kerem bike Erol efendî« û pala xwe da diwêr.
»Na na, gotina xwe bidomîne wê dor bigihê min. Tu ecela min tune ye. Bi rastî tu xweş dibêjî. Tiştekî baş ji berberiyê, pevçûn û kuştinê dernakeve. Di berberiyê de nan tune ye, bi tenê kuştin û malwêranî heye. Hûn hemû feqîr in. Ji dêvla ku hûn bi hev dakevin ji xwe re kar bikin. Bi qasî ku ez dizanim li vî gundî, li dor heyşt hezar donim erdê çandiniyê heye. Sê, çar terektoran bikirin û cot bikin. Di nav erdên xwe de avê derxînin û pembo biçînin. Li qelaçên gund çend çiftlikên heywanan çêkin. Hûn hemû jî ji beytarekî bêtir ji heywên fêm dikin. Heywan li qelaçên we bi xwedî dibe. Zaroyên xwe bişînin unîversîtan. Ma ne wilo ye apê Heso?«
»Ooh tu jî lo! Erol efendî tu ji bihuştê xeber didî. Ziman bêhestî ye, tu çi bixwazî ew ê bibêje. Gotin rehet e, kirin zor e. Em bi kêrî terektor û çiftlik û miftlikan nayên.«
Destê xwe ber bi Luqmên de vekir:
»Aha tu ji xwe re li xwarziyê Circîsko binere, bê çi zir qelafet li ser e û xelk wî birîn dikin, kuro! Wê ew ê ji min re terektoran biajo, ha. Ma terektorên ku bikaribin xwe di bin wî de bigirin hene gelo? Wê Temoyê ku ji pevçûnan direve şifêrtiyê bike hi! Bi telaq ew ê terektorê li me biqelibîne û me hemiyan bi cehnemê şa bike. Circîsko nahêle em dewlemend bibin, Erol efendî. Nahêle ku em ji xwe re kar û emelekî bîkîn. Em

nikarin qereqola Stilîlê, polîs û mehkeman bi wî bihêlin û bi kar û maran dakevin, çavê min. Ev zîlam cigîrê Tecêl e. Xwedê ew jî bo fîtne û fesadîyê çêkiriye.«
»Na na, ne wilo ye apê Heso, her insan tecalê xwe ye. Bi rastî mirov tiştekî ji we fêm nake. Hûn bi devê xwe dibêjin ku Xwedê derd daye derman jî pê re daye. Xwedê him rêya rast û him jî rêya xerab herdu pêş ebdê
114

xwe kiriye. Zarokên we nexweş dikevin, hûn nabin ser textor. Dema ku zarok dimire jî, hûn dibêjin, 'Xwedê wilo xwestibû.' Hûn hevdu dikujin û hûn vê yeka ha dixin situyê Xwedê. Hûn li ba eskeran fitneya hev dikin û hûn di vê fitneyê de Şeytên berpirsyar digirin. Xerabiyê bi hev nekin, dilê xwe safî bikin. Xwedê ne dijminê insên e.«
»Erol efendî tu Circîsko bi qasî min nas nakî. Telaqreşî, bêbextî û hemû tiştên pîs ketîne hestîyê wî. Eger fîtne û fesadî bi tenê di xwîna wî de ba, belkî mirov bikarîba çarek ji xwîna wî re bidîta.«
Erol beşişî:
»Min ev gotina te fêm ne kir, apê Heso. Te ê ji xwîna wî re çareke çawa bidîta?«
»Ma ne bi dû Xwedê de pere tên? Erê lo. Mirov dikare bi qeweta pereyan, dinyê serûqûnî hev bike. Min ê devê textoran ji pereyan dagirta û textoran jî wê ew xwîna wî a genî bi carekê ve biguherta. Lê pîsî ketiye temamê hestiyên wî. Rebenê textoran wê çawa bikaribin qerqodê wî ê telomelî biguherin! Hew rêyeke wê heye, ew jî kuştine.«
Erol fêm kir ku di vê rewşa ne xweş de devjengê bidomîne wê baştir nebe.
»Apê Heso, ez ji mala apê Circîs têm. Wek ku ez ê niha ji te re bibêjim,

min ji wî re jî wilo gotiye.
Ez hêvî dikim ku hûn li hev gilî nekin. Tiştê ku bû, çû. Meseleyê mezin nekin. Hişê xwe werînin serê xwe û dev ji berberiyê berdin. Ji xwe re kar bikin. Li zarokên xwe bifikirin, wan bi hev re nekin dijmin. Li welatê min, xelkê ji zû de dev ji berberiyê berdaye. Herkes ji xwe re kar dike û haha dewlemend dibe. Dev ji vê dijminatiya xwe bi xwe berdin, apê Heso. Ma hema heta dinya hebe, hûn ê wilo bi hev dakevin!..«
Mamoste mirovekî têgihiştî û aştîxwaz bû. Ev heft sal bûn ku li gund mamosteyî dikir. Tirk bû. Dema ku ew û jina xwe Songul hatibûn gund gotineke bi kurdî jî nizanîbû. Xwe hînî zimanê kurdî kiribû. Mamoste ji gundiyekî bêtir kar dikir. Bi gundiyan re diçû çiyê êzing dikirin. Digel xortan bi çirê, babûtan, kab û xar û pereyan dilîst. Fêrî gelek govendên kurdî bûbû. Ew û jina xwe diçûn şevbihêrkên gundiyan. Pez, mirîşk û elok bi xwedî dikirin. Ji mamosteyekî bêtir diruvê gundiyekî bi Erol diket. Di nav temamê gundiyan de bi qedir û qîmet bû. Nav wî û Sarê pir xweş bû. Sarê jê hez dikir. Di destpêka hatina wî de, Sarê çavreşî avêtibûyê. Ew jî ji ber ku mamoste bi zimanê kurdî nizanîbû. Li gora Sarê, mirovê ku bi tirkî bipeyiviya esker bû. Û hîletê wê jî ji eskeran diçû.
115
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Sarê heta ku mamoste xwe hînî zimanê kurdî ne kiriye û mamoste jê re ne gotiye, »Tirk jî wek kurmancan miletek e; di vî miletî de jî pîrek, zilam, zarok û yextiyar hene«, nizanî bû ku tirk milet e. Wê digot qey her mirovê ku bi tirkî dipeyive, ya esker e û ya jî zilamê eskeran e.
***
Civata pizûriyan seet li dor duwanzdehê şevê belav bû. Ji bilî çend kesan, civatê di bin serokatiya Heso de bi tifaq, biryara gilîkirinê dabû.

Sitendina biryareke wilo ji Sarê bêtir tesîra xwe li ser Sadiq kiribû. Sarê ne dixwest ku başçawîş bi pevçûna gundiyan agahdar bibe. Gava başçawîş bi
pevçûnê agahdar bûba, wê herdu hêl hîn bêtir li hev sor kiribana; mesele dê mezintir bûbaya û şerekî ji vî şerê îro hîn dijwartir, li dar ketibûya. Di vî şerî de kî dizane belkî ji malbatan dê çar, pênc mêr bihatana kuştin. Lê Sadiq hîç wek Sarê ne difikirî. Li gor wî eger hûran deh mêr ji wan kuştibana, dîsa jî divabû kesekî ji wan li malbata hûran gilî ne kiriba. Malbatê xwe neavêta tor û bextê eskeran û li heyfan negeriya û hertişt bi
qeweta zend û bendên xwe kiriba. Wî gotibû, »Mirovên qels gilî dikin.« Lê wî tu carî xwe bi malbatî qels qebûl ne kiribû. Heta tu malbat mîna malbata xwe mêrkuj û berberçî, ne didîtin. Li hindurê malê bi qahr piyase dikir, li serê xwe dixist û ji jina xwe re digot, »Pizûriyan bi vê qer-arê dîsa xwe hetikand! Xwe piçûk, dijmin mezin kirin. Hûrî çi ne ku li himber me rabin!..«
Heso û Hemo bi banga sibehê re wê biçûna qereqola Sitilîlê. Civat hemû belav bûbû. Heso li hindurê odê bi tenê mabû. Xwe bi ser hev de kiribû gilok, guhê xwe bi ser aliyê malê de xwar kiribû û kûr kûr difikirî. Di vê kêlîkê de xwe mîna serşîrekî bêqewet didît. Pir dixwest ku biçe aliyê malê razê û bi haweyekî dostanî xwe bigihîne Sarê, da ku di derheqê vî gilî de him Sarê haş bike û him jî di vê navê re ji xwe re hinek cesaretê jê bistîne. Ji xwe re digot, »Eger ez xwe bi haweyekî negihînim xemrevîna xwe, ez ê çawa bikaribim vê tirsê ji nava xwe biavêjim û bi dilekî rehet rakevim!« Xwe di rewşeke pir çetîn de didît. Hêviya wî bi tenê Sarê bû. Dîtin û lênerînên Sarê ji bo xwe pir girîng didîtin. Lê mixabin Sarê jî di nav livînan de geft lê dixwarin, dawa xwe ji kevirên hestep dadigirt û bi ser serê wî de werdikirin. Ji xewa çavên wî venedibûn. Şeva çûyî hîç

raneketibû. Bi roj ji eskeran pir lêdan xwaribû. Li ser hev pênc, şeş gep xwarin ne xwaribû. Di civatê de bi seetan axivîbû. Mejiyê xwe li ser ku çiqekê di Circîs de bike pir xebitandibû, mejî westiyabû. Serê wî, mîna
116

boqa pîvaza bêavmayî bi ser kelêx de dixiliya. Kelaxê wî bi carekê ve li hev geriyabû, nikarîbû xwe biqeliqanda. Hişkiling ketibû. Lê dîsa jî xewa wî ne dihat. Ji tirsan ketibû tayê. Dilerizî. Bi melûlî digot »Weh, ez ji desthilanîn ketim, dîsa çi bi min hat ya rebî! Keçê malik şewitiyê hema dengekî bikuxe, belkî ev tirs ji ser min here!..« Sibehê wê biçûya nig amirhêzekî ku
wî him dê bertîl bidayê û lêdan jê bixwara û him jî dê li gor lênerîn û daxwazên wî, gilî li dijminê xwe bikira. Ji eskeran nefret dikir. Lê ev nefreta wî ne ji ber ku xwe kurd û esker jî tirk didîtin, hemû ji tirsan bû. Ji eskeran ewqasî ditirsiya ku, gava Sîracê cîranê wî ji eskeriyê bi cilên xwe ên eskerî teskere sitendibû û di cavêtê de bi van cilan rûniştibû, wî heta sê
rojan cesaret ne kiribû ku here Sîrac bibîne û xêrhatinekê tê bide. Li mala wî bi cilên eskerî wêne peyde ne dibûn. Hemû wêneyên xwe ên ku di dema eskeriyê de kişandibûn, çirandibûn û heta bi ser wan de mîztibû. Ji tirsa wî tu mêrê pizûrî newêrîbû wêneyekî xwe ku bi cilên eskerî kişandibû, li mala xwe daliqanda. Heso qedexe kiribû. Bi qasî ku ji eskeran û cilên eskerî aciziya xwe dianî, ewqasî jî ji zimanê tirkî aciz bû. Ji ber vî zimanî ne dixwest ku neviyên wî li dibistanê bixwînin. Eger ne ji Sarê ba, heta belkî ji malbata wî kesekî ruyê dibistanê ne dîtiba. Di salên ku li bajarê Edîrnê eskerî dikir, fêrî tirkî û xwendin û nivîsandinê bûbû. Pir dixwest ku vî zimanî ji bîr bike. Lê mixabin berberiya gundikî, mecala ku tirkî ji bîr bike ne didayê. Çima ku berî hertiştî dijminê wî Circîs,

hinekî bi tirkî dizanîbû. Herduyan her ji çendekî hev ber bi başçawîş, komutan û dadgeran de digindirandin. Di berberiyê de zimanê tirkî çekekî mezin bû. Eger xwe ji vî çekî bi dûr xistiba, helbet wî çaxî jî wê nikarîba li qereqola Sitilîlê, li ba komutanên hidûd û dadgeran bi hêsanî fesadiya Circîs bikira; herwiha malê xwe li devê wan biqelibanda ku Circîs tam biperçiqiya û wî jî ji vê perçiqandinê zewq bistenda.
Heso di nav livînan de tibabekî ponijî. Bêî ku Sarê bibîne hîç ne dixwest razê. Carina hêl dida xwe ku here aliyê malê, xwe biavêje tor û bextê wê û vekirî jê re bibêje:
»Ez muhtacê şefqeta te me. Ez bi qeweta te li ser pêyan disekinim. Êdî bes e sergiraniyan li min bike malikwêranê. Bawer bike şêrîna min, eger ne ji wê mêrxasiya te a bêsînor ba, min ê tu carî nikarîba ne mezinahiya malbatê û ne jî bi tu kesî re berberî bikira. Ma gelo bi rastî qey heta niha te hîn jî ji min fêm ne kiriye ku ez mirovekî çendî tirsonek im? Tinaziyan li min neke êzîdî keça êzîdiyan! Ax de ka were ez bi qurbanê lê!..«
Lêbelê adetên wan, rê ne dida ku xwe bigihîne Sara xwe. Li ba wan, jin

li erdê, zilam jî li ser doşekê rûdinişt. Jin desmalka zilêm bû. Jinê wê bida nav rêxê, tepik çêkiribana û zilam jî dê bi halê wê bikeniya û simbêl babidana. Jin bi qelen bû. Heqê wê li herêma wî pênc, şeş hezar wereqe dikir. Jina ku di civata wî de bêrûmet dihat qebûl kirin, helbet divabû bi bazdan xwe biavêta bin lihêfa wî û xwe jê re vegirta. Digot û dibiland, »Ez zilam û ew jî pîrek e, gerek ew bihata nig min û li halê min bipirsiya...«
Sarê jî bûbû kevirê aramê, bêdeng di nav livînên xwe de ji kûr û dûr difikirî. Di dawiyê de Heso xwe ne girt, bi hêrs lihêf ji ser xwe avêt û qêriya:
»Lêlê pîrê pîrê! De ka bêhnikekê were odê em ji xwe re mijûl bibin...«

Sarê mîna ku razayî be deng nebir xwe. Wê ji dûr ve li cavata pizûriyan guhdar kiribû. Di civatê de kî çawa axivîbû û civat li ser çi biryarê belav bûbû bi hemî dizanîbû. Ji Heso hatibû bêvilê, ne dixwest wî bibîne. Temo jî wek her tim dîsa ketibû himbêza Meyro, xew lê giran bûbû. Heso piştî ku gazî Sarê kir, xwe bêhnikekê ker kir. Lê deng ji aliyê malê ne hat.
Bi qahr got, »Ez xwe dixapînim, pîrê nayê nig min! Min xwest, ez xwe hinekî giran bikim ku li himber wê ewqasî kêm ne kevim. Lê wilo xuya ye ku ez çi bikim wê fêde neke« û ji nav livînan çeng bû erdê.
Lempe pêketî û fitîla wê jî tam hildayî ye. Di bin ronahiya lempê de ji dîwarên bi kilsa nikarokî hawêrdor çirûsk diçin; çirûsk bi ser lempe de dixurbilin. Ode tije şewq e. Lê ew bi destpelikandinê li gopalê xwe digere. Bîr nabe ku her der ronahî ye. Eger bi çavan hawêrdora xwe tev bide, ew ê bi hêsanî bikarîbe gopal û şekala xwe bibîne. Lê aqil nake. Ji bîr kiriye ku lingê wî birîn bûye û wê bi vî lingî bêsenede nikaribe bimeşe. Tirsê girtiye hinavan, rê nabe ser tiştekî. Di vê kêlîkê de eger dengê çapiliyekê an gotineke bi tirkî bibihize, miheqeq wê ya dilê wî bisekine û ya jî wê ji hiş bikeve. Xwîn lê vemirî ye, mîna şimê zer veda ye. Nikare rabe ser xwe ji qidûm ketiye. Bi herdu destan ji çep û rastê qurîncekan dide xwe. Bi neperûşkan êrîşî canê xwe dike. Sênga wî a hemû bi pirç, ji neperûşkan mîna cotê qelaçan belek diyar dike. Dixwaze ku li ser çarlepikan bimeşe. Lê dest û lingên wî mîna ku ji hev bêrî bûne, yek ji yekî re nabe destek, heryek li halê xwe diçe. Xwe ber bi deriyê odê de gindorkî gindirand û bi dengekî melûl û şewat peyivî:
»Ooof! Keçê hey agir bi mala bavê ketê, ev çima tu bi min ve nayê lê!..«
Sarê qêriya:
»Naletulah, tobe ya rebî tobe!« û pêrgî wî ve meşiya.
Heso bi giştî di dema ku tirs lê peyde dibû, pir dixwest ku Sarê bi cilên

xwe ên bûkanî li ba wî rûne û hîç ranebe. Di vê bêhnikê de çiqasî dixwest ku xatûna wî bi cilên xwe ên bûkanî derkeve pêşberî wî. Di vî warî de di-gel ku wê jî bi qasî dînê xwe jê hez dikir, wek vê bêhnika berî niha dîsa jî zilm lê dikir.
Dema ku Heso çav li Sarê ket, mîna ku hîç tirs pê re çênebûbû xwe da ser hev û rûnişt. Destê xwe dirêjî destê Sarê kir, rabû ser xwe û bi fen got: »Keçê ma te nizanîbû ku ez ê di nav wê hingama pizûriyan de nikaribim xwarinê bixwim? Ji êvara Xwedê de gezek nan ne çûye nava min. Eger ez îşev jî tiştekî nexwim, sibehê ez ê nikaribim xwe li tena bi-girim, weh! De ka pêşî ji kerema xwe re hinek xwarin ji min re bîne.«
Sarê tiştek li xwe çênekir. Mîna ku ji hertiştî bêhay bû, bi şefqet destê xwe da destê Heso, ket ber pala wî û ew rast bir ser cihê wî. Piştî ku Heso di nav livînan de veziland, bêdeng berê xwe da aliyê malê û meşiya. Bi rastî di vê bêhnikê de ji kêfa, şûr simbêlê Heso ne dibirî. Pişta xwe dabû zemberîşan, bi kêf rîha xwe difirkand, xwe dinepixand û digot »Min pê re xweşik lîst. Bi yek fenê min jinik haş kir...«
Di vê dema ku wilo xwe bi xwe diaxivî, xwe aqilmezin û Sarê jî aqilpiçûk didît, heyvanê tirsê li ser nema bû. Ji kêfa ku wê pîrê kengî lê vegere qûna wî erd ne digirt. Hatina pîrê dilê wî av da bû, av hemû lê bûbû şehwet û li temamê kelaxê wî belav bûbû. Canê wî ê ku pênc şeş de-
qîqe berê ji tirsan mîna pelê çilo dilerizî, di vê kêlîkê de ji cesareta pîrê wek gokekê zewirî bû. Mêranî pê re gihabû hev, doxîna şerwêl vekiribû. Bi destekî li sênga xwe dida û bi destê din jî nav şeqên xwe difirkand. Dev lêvên xwe dikir. Bêsebir ziq li devê deriyê odê dinerî. Dema pêjina Sarê li hewşê kir, bi lez şerwal daxist; hişk bi qereqopkê xwe girt û di doşekê de

bir û anî.
»Ma tu ê li ser livînan xwarina xwe bixwî an li ser kulêv?«
»Na na, laşê min hinekî cemidî ye, ez naxwazim li ser kulêv bixwim« û xwe bi ser hev de guvaşt.
Sarê ber pê de çû. Xwest ku çîmên wî rade û tepsiya xwarinê li ser çîman deyne. Lê wî wek pêhlewanan tepsî ji dest girt, avêt dera ha û ji nişkê ve xwe çeng kir newqa wê. Bi ser xwe de kişand, xist bin xwe û devê xwe xist gwîzeka qirikê.
»Kuro xurifiyo, li ber vê ronahiya lempê tu kirî çi bikî! Ma niha wextê vî tiştî ye!«
Heso lê har bûbû. Bi haweyekî serxweçûyî got:
»Keçê bi telaq ne ronahiya lempê, eger ronahiya şintaqê be jî ez ê bikim

lê« û bi lez derpî jê şemirand.
Sarê ji aliyekî de xwe bi dest ve berda û ji aliyekî de jî mîna ku zor lê hatibe, bi hêrs peyivî:
»Ji vê rîha xwe a bihustekê direj fedî bike! Îşev ne şeva gon û gadanê ye, sofî!..«
Lê Heso jî mîna ku bi cesareta wê re têkeve şehwetê, wê çiqasî bi sistî li ber xwe dida, ew jî ewqasî lê sor dibû. Her gotina wê, te digot qey şirinqeke xwîn ji canê xwe berdida canê wî. Di nav lepên wî de mîna zarokekî bêqewet ketibû.
»Sofî, te miradê xwe kir, êdî ji ser min rabe. Te ez behdilandim.«
Wê wilo digot. Lê di eslê xwe de qet jî ne dixwest ku Heso, xwe ji ser kelaxê wê bide alî. Gava ku diaxivî, guhê Heso ê çepê xistibû devê xwe. Bi herdu destan, pişta wî hişk zeft kiribû û bi ser xwe de diheciqand. Ji

Heso bêtir wê »gon û gadan« dixwest. Helke helk lê ketibû. Lê ji ber ku di civata wê de »gon û gadan« bi tenê heqê zilêm bû, ji mêrê xwe fedî dikir
ku daxwaza xwe a şehwetî vekirî bigota. Wê tu carî xwe pêşkêşî mêrê xwe
ne kiribû, mêr her tim hatibû ser livîna wê. Li gor wan, tiştekî pir şerm bû ku jinê ev yeka ha ji mêr bixwesta.
Heso ji zewqê mest bûbû, lê ne bi qasî Sarê. Taximên diranên wan ji helke helk û kêferata şehwetê, ji devê wan herikîbûn ser doşekê. Qirika Sarê ji girêza Heso bi carekê ve şil bûbû. Xwêhdana Sarê li kirasê wê dabû der, kiras hemû qermiçî bû.
Heso piştî ku got:
»Keçê Sarê, bi telaq tu jineke pir delal î lê! Keçê te ez ho kirim! Xwedê tu carî bizrê te ji dinyayê kêm neke«, rîha xwe li ser memikên wê hinekî gerand û bi hindama dîwêr de xwe serpiştkî qulipand. Sarê xwest ku lihêfê bi ser dake, lê wî berî wê bi guhikê lihêfê girt û kişand. Destekî xwe danî ser zikê Sarê û ê din xist bin serê xwe û ziq li bin zikê xênî nerî. Di vê rewşê de, herdu jî tibabekî bêdeng man.
»Heso, te û pizûriyan we çi xist serê hev? We hofka xwe çawa gerand? Hûn ê gilî bikin an na?«
»Ma tu dixwazî ez çawa bikim? Ev bêbavê çawîş wê ji me re nebêje çi, gelo?«
»Tu çawa dikî bike, lê gilî neke. Gilî bi kêrî me nayê, şerm e.«
»Ez jî dizanim ku gilî bi kêrî me nayê û şerm e; lê em mecbûrê gilîkirinê ne, Sarê. Çawîş wê wilo bi hêsanî dev ji me bernede.
»Ji ber çi hûn xwe mecbûr dibînin?«

»Ji ber ku wê ew kafirê birayê te li me gilî bike, em xwe mecbûr dibînin.«
Sarê bi hinc tepek li sênga wî xist, destê xwe danî ser dilê wî û bi hêrs got:
»Vî dilê xwe ê qirêjî hinekî paqij bigire hey xanî bi ser de ketiyo! Ji êvara Xwedê de pizûriyan yek bi yek ji ser odê qilawizî li mala Circîs dikirin. Eger Circîs xwe ji gund berdaba, ji van qilawizan hinan jê miheqeq wê pêjina wî kiribana. Kûçik wê miheqeq li reşê wî bireyana. Circîs ne mar e ku li erdê bisûrike û xuya nebe, ne teyr e ku bi ezmên de bifire û kesek wî nebîne. Zikê te ji kîn û buxzê reş bûye, tu tu carî nikarî ji xêrê bifikirî. Ez her tim ji te re dibêjim mast, şîr û penêr pir bixwe ku ew hinavên te ên reş hinekî sipî bibin! Hey Xwedê bi ser de ketiyo hilmek û pifek ji te re maye tu ê bimirî, li zarokên xwe bifikire!..«
Dema ku Sarê bi vê bêhntengijiyê diaxivî, Heso jî bêdeng rawestiyabû û lê guhdar dikir.
»Tiştekî ku tu bibêjî êdî ma, xweha Circîsko?«
Sarê xwe da ser hev:
»Bibêje bê tu ê çi bibêjî xurifiyo« û xwest ku rabe.
Heso rê nedayê.
»Keçê bi telaqê jinberdanê ew birayê te ê fesad niha li qereqola Sitilîlê li ba çawîş rûniştiye û ew û çawîş herdu jî zewran li me dişidînin. Ez ji zarokiya wî de wî nas dikim bê çi ê ber golik e. Bi rastî di derbarê vî gilî de ez bi xwe dereng şiyar bûm. Gerek ji zû de ez li qereqolê bama. Birayê te bi hosteyî ez xapandim. Gur e gur!«
»Tu bêbextiyan lê dikî. Ma hema qey wê qilawizekî ew ne dîtiba. Ma ji bo Xwedê hema wê kûçikekî jî xwe êrîşî reşê wî ne kiribaya, haho!«
»Keçê ehmeqê, çima tu ji min fêm nakî? Ez ji te re dibêjim ku birayê te ez xapandim. Îcar mirovê gava ku bikaribe siyasetçiyekî wek min mezin

bixapîne, hayhay wê bikaribe vê mentîqê hemî bixapîne. Wî xwe ji qilawizan vedizî, yanî qilawiz jî xapandin, dibêjim. Lê çawa ne hiştiye ku kûçikên gund pê agahdar bibin, kûçik bi çi haweyî xapandine? Ez niha li ser wê difikirim...«
Gotinên Heso dilê Sarê careke din birîn kiribûn. Wê, bi hêviya ku şer mezintir nebe xwarin ji Heso re anîbû, xizmet jê re kiribû û heta xwe bi dest ve jî berdabû. Ruyê wê ê ku berî niha bi nîv seetekê di deryaya şehwetê de bi qasî bihara nîsanê geş bûbû, di vê bêhnikê de mîna mehkûmên binê zindanan çilmisî bûbû. Xwêziyeke wek zilindêr tal xwe

dabû qurmê zimên, gewrî di xwêziyê de xitimî bû. Bi destveberdana xwe mîna ku qebheteke mezin kiribe didît, kelaxê xwe ji ê Heso bi dûr xistibû, xwe bi ser hev de guvaştibû û ji kûr û dûr difikirî. Heso ji xwe bêtir dixwest ew biaxive, lê şûr devê wê venedikir.
»Keçê pîrê, çi bi te hatiye! Te bi me çiloyê xwe kir, lê te kidase lê ne kir. Wilo nabe ku tu hertiştî qurmiçî bihêle û birevî. De ka bibêje ez li te guhdar dikim, aqil ji aqilan çêtir heye, helala min...«
Heso bi fen pê re diaxivî. Bi tenê tiştek jê dixwest, ew jî cesaret bû. Dixwest ku herwiha mijara wan, li ser çawîş be; Sarê hêrs bibe, siqêfan bi çawîş re bike, ku rehê mêraniyê tê bigerin.
»Heso ma tu dixawzî ez çi bibêjim? Te temamê rêyan li ber min girtin. Qûna ku hînî tiran bûbe, tu paçan jî têxê ew ê dîsa tira xwe bike. Êdî gotin bêfêde ye. Ma ne ez çi bibêjim, tu ê dîsa jî wek xwe bikî û here gilî. Tu û Circîs hûn herdu jî ne ji xêra ometa Mihemed re hatine dinyayê. Hûn herdu bûne wek du kevjalan, lingekî we li der yek li gorê ye, ji mirina we re tirek û fisek maye. Hinekî li zarokên xwe bifikirin hey Xwedê

deh top li mala we xisto« û ji nav livînan çeng bû dera ha.
Heso xwe da ser hev û li qûn rûnişt. Pêşî ruyê xwe bi herdu destan firkand, dûv re çavên xwe hinekî kutkutandin û bi dengekî hêdî got: »Pêwîst nake ku tu xwe ewqasî ji min zivêr bikî. Tu baş bi min dizanî ku ez ne heraqê berberiyê me. Sebebê vê nexweşiyê birayê te ye. Bi rastî Circîs kûra xerabiyê ye. Di vî gundî de xerabiya ku ew dike, kafir jî nakin yanî. Polpolê bi ser min de neke. Bawer bike ez jî bi qasî te ji vê berberiyê zivêr im. Hinekî bêhna xwe fireh bike. De ka were li kêleka min rûne, were were...«
Bi rastî Heso di her gava ku diçû livîna Sarê, pir bêhnfireh dibû û li dor seetekê serê wî pir dixebitî. Di vê seetê de dinya wek qutîkê li ber vedibû, Circîs çi bikira, wî didît. Wî jî bi vî aliyê xwe dizanîbû. Eger ev mirov di civateke jîr û zana de jiyaba, bi hinera eşqa Sarê ji sedî sed wê bomba atomê çêbikira û li ser gotina pîrê bombe biavêta Enqerê û belkî temamê Tirkiyê jî.
Sarê li pêşberî wî li ser kulêv çarmêrkî rûnişt û kitana xwe da serê xwe. Kitan ji qilêrê debixî bû. Gava ku serê xwe daqûl dikir, ziq li ber xwe dinerî û diaxivî, kitanê di bin ronahiya lempê de belek diyar dikir.
»Heso, ji bo ku ev şer hêdî bi hêdî biferike, gilî meke. Tişt ji tiştan mezintir hene. Pevçûna pizûr û hûran a îro bêkuştin derbas bû. Ev tiştekî bedew bû. Qey Xwedê li halê me nerî bû ku dîsa kesek ne hat kuştin. Ez xwe
122

diavêjim bextê te û Xwedê, ez kolê te bim, gilî meke! Xebîneta van xortên me ên nesêlê, bila dîsa neyên kuştin. Pars zor e. Xwedê kesî ji gund û waran bi welatên xerîbiyê de celî neke. Erê, tu jî wek min dizanî ku xerîbî û pars çendî zor e! Hêj heta çend sal berê, em li ser kuştinê ji gundê xwe derketî bûn. Ma te çi zû ew qiriktalî û xizanî ji bîr kir, malneviritiyo! Gilî

meke ez bi qurban...«
Dema ku Sarê wilo bi kelûgirî diaxivî, Heso jî destê xwe dabû ber ruyê xwe, mîna ku hişê wî li ser wê be, li nav çavên wê temaşe dikir û ji kûr û dûr difikirî. Nezaretxana qereqolê dihat bîra wî. Nezaretxane ji zindanên osmaniyan jî bi xoftir bû. Navê wê di deftera qereqolê de wek »Nezaretxane« hatibû nivîsandin, lê dîsa jî herkesî jê re »zindan« digot. Demên raborî mîna filîmekî yek bi yek di ber çavên wî re derbas dibûn. Di zindanê de mar hatibûyê, ji desthilanîn ne ketibû, wî û mêr hev girtibû û mar fetisandibû. Girtina wî dihat bîrê. Li qereqola Stilîlê çawa êşkence dîtibû, çawa berzûrî Xwedê bûbû û dest û lingên başçawîş maçî kiribûn, weke pirûskên êgir li ber çavên wî pêdiket û vedimirîn. Lawê Necîmê hûrî çifte bi xwe de teqandibû û hatibû kuştin. Lê Circîs û hevalbendên xwe ew kuştin xistibûn situyê wî. Circîs bertîl dabû başçawîşê Sitilîlê, hakim û sawciyê dadgeha Mêrdînê. Li dadgehê Necîm li wî û Hemoyê biraziyê wî dabû. Li himber wî, guhdar û temamê heyeta dadgehê bi Quranê sûnd xwaribû, telaqê xwe avêtibû ku qesas ew bûn. Ew û Hemo çar salan li girtîgeha Mêrdînê raketibûn. Malbata wî him hatibû talan kirin û him jî derketî bûbûn.
Heso piştî ku ji kezebê axîneke kûr kişand, xwe li ser kêleka çepê pal da, ziq li Sarê nerî û got:
»Ez te fêm dikim. Ez dizanim ku bi berberiya vî gundî ji herkesî bêtir, tu diêşî. Li aliyekî şer mala bavê te ye û li aliyekî jî zaroyên te ne. Lewra kî zoriya kê bibe dîsa jî hey ji te re ne xêr e. Lê pîrê, ma çi ji destê min tê?«
Sarê ne hişt ku Heso gotina xwe biqedîne. Bi kerb ji cihê xwe qevizî, destê xwe hejand, »Hertişt ji destê te tê!« got û ber pê de meşiya. Kulavê ku li ser rûniştibû hîn derbas ne kiribû, kiras li nav lingan herbilî û ji hindam de devdevkî bi ser çementoyê de kumişî. Eger Heso destên xwe jê re ne kiribana mertal, dê ruyê wê miheqeq xwîn bûbûya.

»Tu derewan dikî, tu dikarî vî agirî vemirînî. Tu mirovekî zikreş û dexsok î. Fesadî ketiye xwîna te. Hedana te bê wê nayê. Temamê vî gundî dizane ku Circîs îşev li mala xwe ye. Lê ji êvara Xwedê de te xistiye serê xwe ku Circîs bi fen û fûtan xwe ji herkesî vediziye û çûye qereqolê gilî.

123

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Dilê xwe hinekî safî bike, hey ji rehma Xwedê û Mihemed mahrûm bûyo!..«

Heso ji aliyekî de xwe bi Sarê re beşişand û ji aliyekî de jî di dilê xwe de got:

»Bi rastî tuxmê pîrekê tuxmekî beredayî ye. Pîrê çar, pênc deqîqe berê gava ez berdabûm ser xwe, ji zewqê hindik mabû biteqiya. Ez maçî dikirim û rîha min dialast. Îcar niha jî mîna ku ne ew pîra berê be, bûye barût û bi min de diteqe. Ma ne hey gema wê di dest min de ye, ez berê wê bidim ku ew ê bi wir de here. Pêwîst nake ku ez a rast jê re bibêjim. Ez ê derewekê lê bikim û ew ê jî qanih bibe û hew.«

Bi rastî jî Heso gava bixwesta di cih de dikarîbû Sarê him ji xwe biengiranda û him jî haş bikira.

»Pîra eskerdijmin, dîsa çi li te qewimiye! Keçê bes bi min de biteqe, bihêle ez bipeyivim. Mala Xwedê ava ku tu him nêr çênekiriye û him jî tu kiriye jina min. Bi qesem te ê mêr bi saxî bibiraştana, ha! Hinekî bêhna xwe fireh bike ku em tiştekî têxin serê hev.«

Bi vê gotinê re ruyê Sarê mîna gulekê vebû. Cihê xwe xweş kir û bi kemlanî:

»Bêhna min fireh e, bibêje bê tu ê çi bibêjî, ez li te guhdar dikim.«

»Ji bilî Sadiq, me pizûriyan di civîna xwe a îşev de bi tifaqî qerar da ku ez û Hemo em ê bi sariya sibehê re herin qereqolê gilî. Lê madem ku tu

ewqasî bi vî gilî ne xweş e, ez ji bona te dikarim niyeta xwe biguherînim. Îcar bila gotin di nav min û te de bimîne. Binere tu gotinê dernexînî, ha!«
»Şerm e ku tu wilo dibêjî Heso. Ma te hîç bihîstiye ku min tu carî gotinên te ji xelkê re gotine?«
»Na. Min ne ji tiştekî got, xwe zivêr neke. Lê dîsa jî mirov hevdu şîret bike baş e.
Ji ber ku dilê min ji Circîs bi xuşûş e, sibehê ez û Hemo em ê herin qereqolê. Eger Circîs berî me ne çûbe qereqolê û gilî li me ne kiribe, em ê jî vê çûna xwe bi haweyê sertêdanekê ji çawîş re bînin zimên. Û na eger Circîs berî me xwe gihandibe çêwîş, ji xwe wî çaxî jî êdî bêminetî ye. Tiştê ku ji destê me bê, em ê tê de bikin. Ma te got çi, Sarê? Tu vê fikira min dihecibînî, an na?«
Sarê xwe çeng kir destê wî û ew bi ser xwe de kişand. Devê xwe xist ruyê wî û bû mirçe mirça wê:
»Wey tu tim hebî lo! Xwedê tu carî sifra te kêm neke. Te vê carê, tam wek camêran kir. Te min ne şikand. Te qedirê min girt. Tiştekî baş ji xer-
124

abiyê dernakeve Heso, dawiya xerabiyê dîsa xerabî ye. Bi soza mêrên çê ha, ku Circîs ne li wir be, tu gilî nakî ne wilo?«
»Bi soz ku wek te derkeve,
ez ê gilî nekim.«
Heso gihabû armanca xwe. Sarê haş kiribû. Di vê kêlîkê de baş pê dizanîbû ku çawa bixwaze, êdî Sarê jî wê wilo li gor dilê wî biaxive.
Heso bi haweyê ku wê têxe dilê xwe lê nerî:
»Sibehê ma ne divê em di dest xwe de tiştekî ji bênamûsê çêwîş re bibin. Em nikarin wilo destvala bi ser de herin. Howeh li vê ecêbê, em bêî wî nikarin malê xwe bixwin, kuro! De ka tiştekî bibêje pîrê, ma em kavirekî

an dîkekî elokan jê re bibin?« û çixareke pêçayî ji qutya xwe derxist. Sarê di bersiva wî de pêşî bi herdu destan û bi hinc şiqam li çongên xwe xist, dûv re porê xwe kişand û bi qahr got:
»Ez kerê Stenbolê berdim ser jina çêwîş û hefsed bavê wî! Tiştekî jê re nebin! Waweylê, tu dibêjî qey ev eskerên qûncilik hemû şirîkên bavên me ne. Bila li we bide û tiştekî jê re nebin. Bav û kalan bi derewan ne gotine, 'Berxê nêr ji kêrê re ye.' Ji lêdanê netirse, Heso. Ma ne hey wê te nekuje, hema bila li te bide, wê çi bibe qey pepûko!«
Heso weke keftarekî bêdeng rawestiyabû û li Sarê guhdar dikir. Xuya bû ku gotinên wê bandor li ser kiribûn. Çavên wî mîna du xarên zindoqî li hev dizîvirîn û dilîstin. Tevzînokên mêraniyê habela bi kelaxê wî ve hildikişiyan, mûyê canê wî rabûbûn, xwêhdaneke sar bi eniya wî ketibû, eniyê ji xwêhdanê dibiriqand. Eger di vê bêhnikê de ordiya tirk bi carekê ve li himber wî sekinîba, belkî hîç tirs ne ketiba dilê wî û êrîşî ser temamê ordiyê kiriba.
Sarê, bi giştî gava mijara eskeran dihat qanê, rê ne dida guhdaran, ji herkesî bêtir ew diaxivî. Lê mixabin di vê şeva ku Heso ewqasî muhtacê gotinên wê bû, wê jî di vî warî de gotin kin dibirî û di cihê xwe de bêdeng disekinî. Piştî ku Heso hinekî serbixwe ponijî, serê xwe hejand:
»Hey gidî Sarê hey, bila kurmanciya gewr û şerê tivingê ba, te ê bidîta bê min ê çi kambaxî bi serê van qûncilikên romê de bianiya. Lê em çi bikin, bila mala felekê xerab bibe ku em kurmanc jî ne kirin tiştek. Barê dewletê giran e, mesele ne bi tenê çawîş e, li pişt çêwîş zir dewletek heye lêêê! Destê bi tenê deng jê nayê.«
Di vê navê re keniya, serê xwe berda ber xwe û dîsa dest pê kir:
»Heylo weylo, ev Hesoyê hejhijî ku nikare bi qelsemêrekî wek Circîs re serî derxe, îcar tew hîn ew ê bikaribe bêemiriya çêwîş jî bike, lawê tirê!

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Berxan jê re nebe, kaviran, elokan, dîk û mirîşkan, hêkan jê re nebe, quzelqurtê jê re nebe baş e. Lêbelê ka ew mêrê wilo gubgub e! Gelo mêrekî wilo dilweqî û gunmezin li vê dinyayê heye! Bi tenê yek heye, ew jî Xwedê ye. Ji Xwedê pê ve kes nikare bi van segbavên tirkan. Keçê bi telaq ew jî hevalê wan e. Kes nabe hevalê qelsan, herkes dibe hevalê xurtan.«

Sarê bi qahr rabû ser xwe û berê xwe da derî. Gava xwe avêt ku bimeşe, lê ne meşiya, di cih de li paş xwe fitilî û xwe bi ser Heso de daqûl kir:

»Hêviya min ji wî rebê banî ku lingê te ê din jî bişikîne. Bes bi Xwedê re kufiriyan bike, wê Xwedê xanî bi ser me de biherifîne, rîhsipiyo. Ji çawîşê xwe re tu çi dibî bibe û bes xwe biberizîne Xwedê!«

Heso mîna ku mar bireve bin, ji nişkê ve çeng bû, li Sarê nerî. Piştî ku got:

»Erê erê Sarê!« û dîsa bi ken çûyê:

»Kesî tu polê Xwedayê te ne firandiye ku tu xwe li ser dixeyidînî. Bi rastî divê mirov carina kufiriyan jî bike. Di kufiriyan de xêr û selamet heye. Eger ku ez bi Xwedê re ne kufirîbama, ez ê çawa bi xwe şiyar bûbama ku ez bi lingekî me! Howeh li vê ecêba kesnedîtî, ji êvar de em bîst, sih zilam li hev rûniştine, heryek ji me bi aqilê xwe tahtan diqelêşe û çewaleke gotin dike, lê nayê bîra kesî ji me ku lingê min fikyayî ye! Bi vî lingê fikyayî mirov wê çawa heta qereqola Sitilîlê bimeşe! Keçê tu çi wilo wek eskeran di ser serê min re sekiniyî, zimanê min ji tîna kişiya avinê bide min!«

Sarê bi lez ber bi serşokê de çû. Satil tije av bû.

»Kuro Heso ez tasê nabînim. Ne be ku ji vê civata îşev hinekan jê tasa me dizî be?« û li dor xwe nerî.

»Ê hema bi telaq ku hinekan ew tasa me ya delal dizîbe, ez ê sedûbavekî ji wan çêkim. Min ew tasa sifrînî ji sifirkerên Mêrdînê, tam bi pênc wereqeyan kirîbû. Du ritil av diçûnê...«
Tas di navbera Sarê û Heso de li ser çementoyê bû. Dema ku wî av xwestibû, ziq li ava hindurê tasê nerîbû. Binê tasê bi hindur de kubyayî bû, tibabê bihustekê fireh û bi qasî tiliyekê jî bilind bû. Gava ku mirov bi destekî av pê vedixwar, kubika wê li bêvila mirov disekinî, avê xwe bi aliyekî de berdida, mirov jî ji mecbûrî fir dikir. Tas li himamên Mêrdînê bi kar dihat. Lê Heso ew ji Ebû Şeqloyê sifirker bi hesabê ku avê pê vexwin, biha kirîbû. Li gor wî tiştekî pir luks bû.
Sarê piştî ku poşmaniya xwe anî:
126

»Hiş di serê me de nemaye, me gunehê xelkê jî hilanî«, rahişt tasa tije av dirêjî destê Heso kir û dîsa li pêşberî wî rûnişt.
Derdora tasê bi carekê ve ji rûn dibiriqand. Temamê civatê av pê vexwaribû, bêhna zinix jê difûriya. Heso piştî ku çar qurt li avê xistin »ohyan« got û hema wilo bi gotina xwe re domand:
»Erê kuro li vê ecêbê, belkî herkes xurifî bû, ma ez çawa bîr nabim ku lingê min fikyayî ye! Eger me bizanîba ku sibe sersal e, ehmeqekî ez bi vî lingê min ê fikyayî agahdar kiribama, ma min kengî ev barê gilîkirinê di-girt ser pişta xwe. Tobe tobe ya rebî! Ev bêhişiya min hemû ji destê Circîsko ye!«
Sarê bi ruyekî sar û qermiçî:
»Nizanim bê tu çima xwe ewqasî zivêr dikî, lo. Xem nake, kêmaniyek bû, we kir. Îcar pêwîst nake tu vê meseleyê ewqasî mezin bikî. Tiştê çû mede dû, Xwedê ji te razî. Ne mirin e ku ra lê nebe.«
»Çawa yanî ne mirin e ku ra lê nebe? Ma tu dixwazî ez çawa bikim?«

Di vê navê re dengê ewte ewta çend kûçikan ji tara jêrê dihat. Bi dengê kûçikan re Heso gotin birî û bi xof li Sarê nerî! Lê Sarê jî bêî ku pacê veke, li ber pacê ser pêyan sekinî û guhê xwe da ser kûçikan. Bêhnek ne çû, deng ji Doguj jî hat. Doguj mîna ku bi dû dizan bikeve, bi hime him xwe dadida.
Dilê wî sivik sivik lê xist:
»Keçê pîrê, ev dengê Doguj e. Ev kûçik vala nareyê. Ne be ku Circîsko esker anîbin ser me an Circîsko ji gilî vegeriyabe?« û lihêf bi ser serê xwe dakir.
Gelek ne çû deng ji kûçikan biliya. Lê Heso hîn jî lihêf ji ser xwe ne avêtibû.
»Kuro ma tu raza? Rabe ser xwe, çend gotinên min mane, ez ê wan jî ji te re bibêjim û herim razêm.«
»Bibêje pîrika Reşo, bibêjbê bê tu ê çi xweliyê li serê min kî!«
»Sibehê bi xêr li bergîla xwe siwarê, dîkekî elokan bi xwe re hilîne û here ba çêwîş. Ji xwe wek ku me gotibû, eger Circîs tu gilî ne kiribe, hûn ê jî vê çûna xwe ji çêwîş re bi haweyê serdana sersalê bînin zimên û hew.«
Heso ji nişkê ve lihêv ji ser xwe avêt. Bi hêrs kulma xwe li doşekê xist, toz ji doşekê bi ser ruyê wî de bilind bû. Kuxiya. Kuxuka wî ne sekinî. Lê wî guh neda kuxukê û zorî da xwe:
»Keçê ma tu nizanî ku bi kavir û beran û gîsk û nêriyan em diçin ser-dana çawîş û midîrê Stilîlê, hi! Ma me di kîjan rojê de, ji wan re bi elokê

re beran ne biriye ku tu xwe wilo li ehmeqî datînî û xaşomaşo dipeyivî! Li dera ha rûne û li min guhdar bike, bê ji roja ku gundê Stilîlê bûye nihye û heta niha, min bi destê xwe çend pez ji segbavê midîr û çawîşan re

birine, ez ê dîsa hemî yek bi yek di bîra te de bînim. Belkî pêncî carî ku ez vê meseleyê ji te re bi dar ve dikim, bila vê carê jî bibe pêncî û yek, qey ev jî qedera me ye bavo...«

Sarê û Heso her sal berî cejna Remezanê û Qurbanê bi mebesta ku Heso pezekî ji çawîş re nebe, wek şêr û piling li ber hev pandibûn û bi gotinên dijwar radihijtin hev. Sarê jineke merd û ewqasî jî berberçî bû. Çavtengî li dor peyde ne dibû. Ji ber vê merdî û mêraniya wê, dost û dijmin, temamê gundiyan qedir û qîmet didanê. Lê ji eskeran pir bi kîn bû. Qet ne dixwest ku ne ji mala wê û ne jî ji mala gundîyekî firingek bigiha destê eskerekî. Her sal hin alîgirên Berzanî gava li herêmê bi dizî pere didan hev, Sarê berî ku van alîgiran ji mala xwe bi rê bike, pêşî digel gundiyên hevalbend li odê bi civatî rûdiniştin û hesabê ku di sala çûyî de çend mirîşk, dîk û elok û pez û hwd. gihabûn çêwîş, dikir. Bihayê mirîşk, dîk û elok û pezên ku gihabûn çêwîş li hesêb dixist, hemû dikir pere û dida alîgiran. Ev pere jî bi mebesta ku Berzanî şer bi tirkan re dikir dida. Alîgiran wilo xistibû serê wê.

Heso jî wek wê ji eskeran bi kîn bû. Lê wî, dan û sitendina bi eskeran re mecbûriyeteke mezin didît. Eger wî jî wek Sarê kiriba, belkî tu carî nikarîba li gundê Zorava rûnişta. Ji ber ku serokatiya herêma ku ew lê rûniştîbû, eskeran dikir. Li vê herêmê hebûn û nebûna mirov, hemû bi insafa esker û polîsan ve hatibû girêdan. Tirkan hemû dezgehên dewletî li herêmê dameziandibûn, lê berpirsiyarê hemiyan jî esker û polîs bûn. Muxtarên gundan, reyisê belediyan û hwd. hemû li ser daxwaza komutan û komîsêran dihatin hilbijartin.

Xelkê herêmê mîna ku di demên raborî de bêş didan axan, wilo bêş didan midîr û komutanan. Di navbera salên 1930 û 1940î de ku dewlet li herêma omeriyan tam hakim dibe, îcar bi navê »Eyda Çawîş û Midîrê Stilîlê«, bêdevjeng salê du caran ji bo midîr û komutên di cejna Remezan

û Qurbanê de pere didan hev. Dûv re piştî demekê, li ser emirê midîr û komutên, muxtaran vê carê jî bi sebeba »Cejna Komarê« salê sê caran pere dan hev. Talana ku di herêmê de dibû, di nav komutanê hidûd, yuzbaşiyê tabûra Nisêbîne, başçawîş û Midîrê Sitilîlê de par ve dibû. Hertiştên xwe bi şêwir û tifaq dikirin. Cezê nedana bêşê, giran bû. Mirovê dema ku bêş qebûl ne kiriba, ji teref komutên êşkenceyeke mezin
128

didît. Muxtarê gundê Cinata Girdo carekê ji ber ku bêşê bîst rojan dereng tîne meqamê komutên, komutan wî sê seetan bi darê ve dadiliqîne.
Heso ji destê midîr û komutanên qereqola Stilîlê pir kişandibû. Malê wî pir xwaribûn. Êşkence pê kiribûn. Ew di nezazaretxana qereqolê de gelek rojan bênan û av hiştibûn. Ji ber van sedeman bû ku wî, navê temamê midîr û çawîşên ku hatibûn Stilîlê bi carekê ve ezber kiribûn.
»Ez naxwazim li te guhdar bikim. Bûye nîvê şevê. Eger ez xwe bikim wek te û li te guhdar bikim wê li me bibe sibeh. Min çi ji te û çawîş û mawîşa ye! Xwedê bike tu malê xwe hemî bide wan teresan, wey bimir!..«
Heso piştî ku got »Baş e baş e, ez ê bi çend gotinên girover kin lê bix-im«, rabû ser kabokan. Ji kûraya kezebê keserek veda, serê xwe hejand û bi herdu destan tewirand:
»Di roja ku romiyan navê xwe li gundê Stilîlê kir û ji çawîşê qereqolê mezintir midîrek anîn vî gundî, guran li ba şikefta Kunheftarê tam nozdeh mîhên me kuştibûn. Ez wê tarîxê qet ji bîr nakim, Sarê. Îcar ji wê rojê û heta niha, tam hivdeh midîr û bîst û neh qomandar li Stilîlê bi cih û war bûne...«
»Heso, niha ne wextê vî hesabî ye. Şev derbas bû. Hinekî ji xwe re razê

ku tu bi wext xwe bigihînî qereqolê.«
Heso xwe aciz kir.
»Keçê bihêle, ez gotina xwe biqedînim! Şev derbas bû bi esfelesafilîn kirî, weh!..«
Sarê xwe bi ser hev de guvaşt, devê xwe tije kir ku bipeyive, Heso rê nedayê.
»Di roja ku romiyan navê Sitilîlê kiriye 'Akarsu' û heta niha, min 33 beran, 24 kavir, 13 nêrî û 18 gîsk dane midîr û çawîşan. Îcar bi dest pereyên ku min dane wan, ji xwe nayên tu hesaban! Lawên teresan ji kîsê me, hemû bûn xwediyên milyonan!..«
Ew hîn wilo diaxivî, Sarê rabû ser xwe û destên xwe bi hev firkandin. Piştî ku bêhnekê wilo sekinî ma:
»Hema bêbeleyeke mezin ev
tav jî di ser me re derbas bûbûya, ya rebî« û berê xwe da xaniyê malê. Bûbû derengî şevê. Reşaya ewran xwe berdabû ser gundê Zorava, ji bestê gund xuya ne dikir. Çemê ku bi ro li dor du metroyan rabûbû ser xwe û mîna aşan deng dida, dapiçiyabû. Bi zorê dengê destarekî jê dihat. Kûçik ne direyan. Herder bêpêjin bû. Lê Heso hîn jî raneketibû. Xwe

serpiştkî vezilandibû, ziq li maxên bin zikê odê dinerî û ji kûr û dûr difikirî.
***
Banga sibehê lê xistibû. Ji çiyê qebeqeba kewan dihat. Mijê xwe berdabû ser gund. Bê ne dixurbiland, lê dîsa jî sar bû. Ji mijê qelaçên gund diyar ne dikirin. Deng ji çem biliya bû. Çem mîna marekî teyar bêpêjin diherikî. Çûkên beytik serê xwe di hêlînan re derdixistin û dîsa dikişandin

hêlînan. Cesaret ne dikirin ku bifirin. Dîkan bang didan. Yekdengan çêlek dioriyan. Kebaniyên malan hîn ji xew ranebûbûn. Dixan ji hilorîkan ne diçû. Melê gund dîsa azan nedabû. Li ser rêya Îpekê çûn û hatin tune bû. Eskeran xwe ji tabiyan bernedabûn.
Ji mala Heso, Sarê berî herkesî şiyar bû. Kirasekî gewr î gulgulî bi ser taziyê xwe de berda. Li benikê pişta xwe geriya, çavê wê bi hepiriya Meyroyê ket. Bêmefer destê xwe dirêjî hepiriyê kir û bi yek tûşê newqa xwe girêda. Kirasê wê ji newqê û berjor de hawêrdor mîna balonekê nepixî. Ji nepxa kirês û qermîçonkên hûr, vekirî diyar dikir ku newqa xwe çendî bi ser hev de şidandiye. Barşewala rabûbû ser xwe. Bêderpî raza
bû. Avika Heso gihabû derpiyê wê. Li gor dînê wan, derpî herimî ya jî mekrûh bûbû. Hîn bi şev derpî li hev pêçabû û xistibû bin balîfa xwe ku bi roj bişo. Ber bi derî de bazda û mîna ku tiştekî xwe ji bîr kiribe ji nişkê ve sekinî. Pêşî li texma ku zarok raketîbûn, nerî. Dûv re xwe bi ser çon-gan de tewand û di şibakê re li der ve temaşe kir. Ji mijê her der wek hêkê sipî xuya dikir. Bi dû ku got, »Li min pepûkê berf bariyaye! Wê Heso di vê berfê de çawa here nig çêwîş!« û xwas xwe çeng kir hewşê.
Da nav pirikê û ber bi odê de meşiya. Gavên xwe fireh û sivik avêtin. Ji çelpe çelpa lingên wê pirik bi ser çîman û kirês de dipekiya. Kirasê debixî, ji qilêrê bûbû wek şemedanê, av ne dikişand.
»Heso Heso qiriko, rabe ser xwe, ro hilat!«
Heso digel ku hişkiling ketibû dîsa jî hetanî derengî şevê raneketibû. Xwe bi xwe civat çêkiribû. Geh çawîş dianî gund, geh ew diçû nig çêwîş geh Circîs li ba çawîş didît geft li hevalbendên xwe dixwar û digot, »Hela ez xericîm, min nezanî kir û ez ne çûm gilî, ma we çima bi a min kir û hûn ne çûn gilî?..« Bi vê taswasê raketibû. Xew lê giran bûbû. Du balîf xistibûn bin serê xwe û li ser piştê di xew re çûbû. Balîf ji ser hev çûbûn:

Yek ber bi piştê de û yek jî bi ser çementoyê de şemitîbû. Te digot qey bazinê situyê wî xiliyabû, qotê serî bêlept û senede li hewa sekinîbû. Devê
130

wî mîna zîhayekî birçî ji hev vekirîbû. Ji kortika qirika xwe hewa distend. Lê ew jî bi zor. Kefinc bi devê wî ketibû. Rîh û simbêlan ji kefincê wek dara ku di bin berfê de bimîne, xuya dikir.
»Kuro Heso hey agir bi mala bavê keto, zû rabe ser xwe!..«
Sarê hişk bi milê wî ê çepê girt û bi hêrs hejand. Heso veciniqî. Nehişî çeng bû, rabû ser xwe û bi dengekî pêt got:
»Ez xulamê jina te bim begê min, tu ê bes li min bidî, te ez bi lêdanê kuştim!«
»Kuro begê çi! Ez Sarê me, Sarê!«
Heso giriya û çarmêrkî rûnişt. Bi kirasê jina xwe girt, lingên wê maçî kirin û dîsa bi kelûgirî axivî:
»Begê min, ez kûçikê ber deriyê te bim, hema vê carê min bibexişîne ma qey wê çi bibe! Ûy ûy ûy!..«
Sarê piştî ku got:
»Hey min xweliya heft welatan li serê te kiro, qaşo tiro zilam e« û bi baz-dan ji odê derket.
Meyro xwe li ser tenişta rastê pal dabû û zaroka xwe şîr dida. Temo kelefekî wê xistibû nav şeqên xwe. Herdu çepilên xwe di newqa wê re derbas kiribûn, devê xwe bi movikên pişta wê ve didewisand û ew bi ser xwe de diguvaşt. Dixwest wê maçî bike, têhna wî ne dişikest, îcar dev lê dikirê. Ji girêza devê wî pişta jinikê şil bûbû. Wê jî xwe di nav çepilên wî de xiloxavî kiribû. Mijandina memikan di hisên şehwetê de tevgeriyabûn û bêhemdî xwe ji navikê û ber jêr de hertiştê xwe jê re berdabû. Ji helke helka wê, temamê qul û qulikên di canê wê de vebûbûn, can di cên de

wek asfincê dimijt. Xwêhdaneke hûr bi eniya wê ketibû. Rehên situ di-jenîn, reh bel bûbûn. Di lepta tilmiqûnan de lêvên wê diricifîn. Tilmiqûnan kiribû seyran. Ji reqsa mijankan dixuya ku di jêr û ber jêra wê de çawa xunav dibare. Eger di vê bêhnikê de Sarê ne hatiba, ji sedî sed
vê jinikê Temo radikir govendê.
Sarê bêhnçikyayî got:
»Keçê Meyro zû deyl Temo bike!« û ber bi dergûşê de meşiya.
Temo ji nişkê ve xwe da ser hev. Kaboka wî li kêleka Meyro ket, Meyro xûz bû û barînî bi zarokê ket.
»Dîsa çi tofan li me rabûye pîrê!«
»Zû rabe ser xwe ku dibêje çi tofan li me rabûye, tofana herî mezin li me rabûye, bavê te dîn bûye!..«
»Tu çi dibêjî lê? Bavê min çawa dîn bûye!«

»Kuro wilehî din bûye, ma qey tu ji min yeqîn nakî? Mêro, min li ber çavên xwe wek çêwîş dibîne. Dest û lingên min maçî dike, xwe diavêje tor û bextê min û dibêje 'Begê min, qomandarê min, ez kûçikê te bim, min bibexişîne..'«
Temo bi van gotinan ji tesîra şahwetê derket û xwe da ser hev. Rahişt mîkutkê Nêrgizê bi hêdî li dergûşê xist û beşişî:
»Yadê, niha tu bi qedirê Xwedê kî, bavê min bi rastî ji te re gotiye 'begê min' hi?«
»Lo lo te porê yadê kur kiro, xwezîka hema bi tenê bi qomandar ba jî! Ji aş û baş dabû nav û digot...«
Dema ku Temo û diya xwe ketin hindurê odê, Heso pala xwe dabû

dîwêr û difikirî. Dizanîbû ku tiştek lê qewimiye, lê çi tişt e tê dernedixist.
»Yabo xwe pev bixe, bû dereng. Ma te xwe ji bîra kir ku tu û Hemo hûn ê bi sariya sibehê re biçûna nig çêwîş?«
Heso di bin çavan re awir dan Sarê. Çavên xwe tibabekî ji ser ne guherand. Dûv re hilda xwe ku rabe, nikarîbû. Wek dînan li dor xwe nerî:
»Esas dijminê min ê mezin di mala min de ye« û berê xwe da Sarê û vê carê jî bi dengê bilind:
»Keçê ma te nizanîbû ku min ê bi şeveqê re xwe bigihanda ba quzelqurtê çêwîş! Te çima deyl min ne kir?..«
Sarê mîna ku ji hertiştî bêhayî be, tena tena ber bi satila avê de meşiya. Hûçikên wê ên dirêj û vekirî mîna tûmên şahfela bi dû cencerê ve xwe berdabûn ser çementoyê, çemento dialast û bi dû de dikişiyan. Tas di hindurê serşokê de bû. Xwe bi ser tasê de daqûl kir, çena wê li dîwarê dikê
ket. Mîna ku çena wê li dîwêr ne ketibe, tişt li xwe çênekir, bêdeng rahişt tasê û bi kirasê xwe paqij kir. Tas di satilê dakir û ber bi Heso de çû:
»Vê avê vexwe belkî hişê te bê serê te.«
Heso serê xwe tam rakir û ziq li ruyê wê nerî. Xwe bi ser hev de hilqerast û qiriçand. Ji halê wî xuya dikir ku ne dixwest gotinên çort bi Sarê re bike. Bi destekî ferşê kaboka xwe zeft kir, destê din bilind kir û hejand:
»Xweha Circîsko îcar çi ye? Ma qey tu dixwazî ez bibim kafir? Di vê ro-jiya remezanê de ez ê çawa avê vexwim!«
»Kuro tu xurifiyî xurifî, here ba şêx û mişayixan bila ji te re niviştekê çêkin. Bavê Luqman te aqilê xwe berdaye...«
Wî ne hişt ku ew dawiya gotina xwe bîne, destê xwe li tasê da û av hemû bi ser de rijiya. Xwe qulipand ser piştê, qotê serê wî li dîwarê odê ket.
132

»Ay yabo! Lo Xwedê, qey bi rastî tu ne li ser edaletê yî! Ez ji bo te rojiya xwe naxwim û tu jî serê min li dîwaran dixî, ha!..«
Sarê bi lez ji hindur derket. Temo xwe ne girt pirqînî pê ket û zorî da ken.
»Lawê kerê, ev çi hewala we ye îro! Diya te ji xwe fedî neke avê bi ser min dadike û tu jî bi min dikenî! Ma wê çima jinik ji xwe fedî bike, yabo qurbano, insanê ku mirov nîh...ê û ji xwe fedî ne kir, ne taseke av, dikare kûzeke av bi ser mirov de dake. Xanima diya te niha av bi ser min de dakir û êvarê jî wê min berde ser xwe. Ha ji te re birako, pîrek ev e ha.«
»Bavê min ê delal, xwe ewqasî zivêr neke, lê tu li diya min neheqiyê dikî. Îro ne Remezan e, te rojiya çi girtiye?«
Heso bi van gotinan mîna ku tu cerek ava qerisî bi ser dakî, di cihê xwe de sar bû. Serê xwe berda ber xwe û bêhis û pis sekinî. Piştî ku bêhnekê ponijî, keniya:
»Wey li aqilê min û bavê min be, Xwedê serê min li dîwaran dixe û ez dîsa jî bi ser hişê xwe ve nayêm. Xwedê dixwaze min şiyar bike û Sarê dike
horî, tasek ji ava kewserê dixe destê Eynulheyata min ku ez ji destê wê vexim û bibim horiyê wê ê nêr. Û dîsa jî ez bi xwe şiyar nabim. Bi rastî di vê sibeha sersalê de, ez jî wek gelek şêxên kurkur e dikarîbûm bifiriyama ezmanan...«
Heso çiqasî digot, Temo jî ewqasî dikeniya. Şerwalekî gewr î bi navran li xwe kiribû. Şerwal li ser navikê şidandibû. Gava ku dikeniya zikê wî ê bel wek kodika êş dihejhijî.
»Yabo, bi van henekan tu dixwazî gotinê ji ser xwe biqulipînî, min bike hevalê xwe ku bi zanatî te xwe li dînitiyê daniye û dînitiya xwe wek jîrîtiyê bi min bide qebûlkirin. Lê ez bawer nakim ku tu ê bikaribî vê yekê bi diya

min bide daqurtandin. Xweha Circîs pîrekeke yeman e!..«
Ew hîn wilo diaxivîn, Hemo qapûtê wî di dest de û kete devê derî.
»Weh weh, ev çi ye apo! Tew min digot qey ez dereng mame, apê min deyl ji min kiriye û çûye. Zarok sersala xwe didin hev, ro qamekê hilatiye û hîn jî tu di nav livînan de yî. De zû zû xwe kar bike, te li me kire dereng!«
Heso piştî ku ji Temo re,« Ji min re taseke av bîne«, li Hemo nerî.
Qutiya tûtinê avêt ber û got:
»Bavê mino, hêdî hêdî bêhna xwe fireh bike. Ne tu di şer de yî û ne jî ez di cebhê de me. Em ê herin weh! Dereng be, wê çi bibe qey. Ez kerê Stenbolê berdim ser jina çêwîş, tiştê ku ji qûna wî û bavê wî tê bila texsîr

neke. Ma ne hey lêdan e, hema bila li me bide. Erê, de ka bibêje bê çima te ew bedil li xwe kiriye? Dibêje qey em ê herin dawetê. Qerewat ji te kêm
e, te qerewatek jî girêda...«
Hemo bedilekî reş li xwe kiribû. Bedil hîn ji dema zavetiya wî de mabû. Di rojên ku diçû Nisêbînê û qereqola Sitilîlê li xwe dikir. Jina wî di her cara ku bedil dişûşt, pêşî dikeland. Bedil ji rengê xwe derketibû, nîvgewrî bûbû. Wek kîsê hesarê her derên wî bi qermîçonk û li hev tewyayî bû. Gava rûdinişt, pantor bi jor de hildikişiya, gurçikên çîmê di navbera gorê û delingan de wek serê zarokên heft rojî xuya dikirin. Qutikekî qedîfeyî sor di bin çakêt de li xwe kiribû. Berstika qutik û çakêt li hev geriyabûn, heta ku mirov ne çûba ber û tam bala xwe nedabayê, mirov tê dernedix-ist ku berstika qutik bi çakêt an a çakêt bi qutik ve ye. Qayiş di sê qulpikên şerwêl ên paş re derbas ne kiribû. Qutik ji pêş ve di bin qayişê û

pantor de bû û ji paş ve di bin qayişê re xwe bi ser pantor de berdabû. Qayiş naylonî û sipî û bizmik mezenî bû. Bizmik tam li ser navikê rûniştibû, ji dûr ve wek nalekî diyar dikir.
»Apo ma ne çêtir e ku ez bi bedil derkevim meqamê çêwîş? Bedil mirov kubar dide xuyakirin. Bila çawîş bizanibe ku em ne ji malbateke wilo hayela nin, em malbateke mezin û ji xwe razî ne...«
Heso ji qahra nava xwe, bi gu
hikê lihêfê girtibû, tiliya xwe wek şûjinê di guhik de radikir û hirî dik-
işand. Geh ji qurm de bi rîha xwe digirt, çena xwe diheciqand û çavên xwe dikutkutandin. Te digot qey li ser mûristanê rûniştibû, di cihê xwe de habela diqeliqî.
»Bes e bes e, te ez kirim heban! Eger hema tu du gotinên din bibêjî, bi Mishefa Reş ez ê ji hev belav bibim! Mêrik ji malmezina ye, kubar û ji xwe razî ye, hi. Bê çi qure ye. Tu li şerwalê wî, tu li çakêtê wî, tu li halê wî, tu li fiqrê wî binere. Yanî niha tu bi xwe dizanî ku tu bûyî wek lewleba meşkê. Aha doh bû, Circîsko demaçe li ser me vala kir...«
»Yabo, pêşî xwirîniya xwe bişikîne û dûv re wê çixarê bikişîne.«
»Dirêj neke! Metrehê li ser bergîlê baş bişidîne. Girikeke penêrê bi sîrik, du, sê pîvazan û çend nanan têxe tûrik. Ji pîrê re bibêje, eger bastêq mabe,
du top pastêq û sê, çar çeng mewîj jî wekî din têxe kîsikekî û biavêje binê tûrik.«
Temo wek pûtekî li ser lingan sekinîbû û bi hirmet li bavê xwe guhdar dikir.
»Ha, kuro bise neçe, min a herî girîng ji bîr kiriye!«
134

»Bibêje yabo.«

»Tûtin tûtin! Lawê qahpikê çawîş, bi ser birîndariya me de dikare me şeş, heft rojan jî têxe zindana qereqolê. Di cihê teng de çixare sebir û wens
e. Eger li malê kîsekî naylonî peyde nebe, bila pîrê tûtinê ji me re têxe kîsê
şekir. Ha, berî ku tu here vê jî ji bîr neke, neh, deh tax pel jî têxe nav tût-inê.«
Hemo çixare dipêçan. Haziriya ku bi rê de bikişînin, dikir. Gotina
Heso pê beloq hat, keniya:
»Apo ewqas tûtin û pel hewce nake. Ez bawer nakim ku çawîş me bi-avêje zindanê.«
Heso hîn nîvê çixara xwe ne kişandibû, qûnika çixarê di nav lêvên xwe de bir û anî û bi serikên lêvan çixare pekand ser çementoyê. Li xwirînî çixare kişandibû. Ji devê wî bêhneke wek peza ku bi saxî di nav êgir de bikizire, dihat.
»Tu bi qasî min van bêbavên r
omiyan nas nakî, Hemo. Nan û ava wan li ser kabên wan in. Romî çi ji camêriyê fêm dikin? Em ê dîsa jî bi tedbîr herin.«
Hemo di dilê xwe de beşişî. Devê wî ji hev veziliya û çenawî a qewsikî bi jor de bilind bû. Destê xwe danî ser qebza demaçê û bi kubasên qew-likê demaçê lîst. Kubase girtin û vekirin. Wek beruyên ku di nav agirê sobê de biteqin, qupînî ji kubasan dihat. Di bin tesîra hinera demaçê de, bi haweyekî ji xwe razî peyivî:
»Apo bi rastî tu mirovekî pir bi aqil î, romî bêbav in. Ji qenciyê tiştekî fêm nakin. Çawa ji wan re baş be wilo dikin« û keysa xwe li rûniştinê xweş kir.
Bi lez xwêziya xwe daqurtand, xwest ku axavtinê bidomîne, lê Temo ji hewşê bi dengekî hêl bang kir:

»Yabo hertişt temame, êdî hûn dikarin bi rê kevin.«
Heso xwe da ser hev ku rabe, lê nikarîbû. Hemo mîna pisîkê xwe çeng kir ber û bi zendê wî ê rastê girt. Kete bin pala wî û ber bi derî ve meşiyan. Sarê di devê derî de pêrgî wan hat. Şerwal, qutik, êlek û şifqa Heso li ser milan û ferek qundera wî jî di destê wê de bû. Serê xwe hejand û liklikî:
»Waweylê waweylê, kuro ev îro çi bi we hatiye, we aqilê xwe xwariye qey! Li min pepûkê Heso bi vî halî tu ê çawa here ba çawîş!«
Heso milê xwe ê çepê da dîwêr. Pêşî ziq li lingê xwe ê pêçayî, dûv re jî li bejna xwe nerî û got:
»Xweha Circîsko, halê min çawa ye qey? Ez wek bivir im, bivir.«
135
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Sarê dîsa keniya. Piştî ku ji Heso re got »Gotinê dirêj neke«, ket bin çepilê wî û ew kişand hindurê odê, li Temo û Hemo nerî û bi hêrs peyv domand:
»Erê me fêm kir ku mezinê pizûriyan Heso beg, ji şevê din û vir ve xurifî ye. Lêbelê ma hûn jî xurifî ne ku hûn ê vî xurifiyê ha bi tena bêceme û fanêreyê sertazî bibin meqamê çêwîş!«
Hemiyan li hev temaşe kir û bi aqilê xwe keniyan. Hemo destekî xwe danîbû ser demaça xwe, bi destekî jî devê xwe girtibû û habela di bin simbêlan re dikeniya. Sarê cilên Heso lê dikirin.
»Kuro bêhna genî ketiye lingê te ê pêçayî. Vî mûyî ji ser lingê xwe biavêje.«
Heso di nav lepên Sarê de bêtaqet ketibû. Mîna zarokekî sêwî ku li dikana beqêl binere, ne bikaribe tiştekî bikire û ne jî bi ser bavê xwe de bigrî, melûl melûl lê temaşe dikir.
»Heso ez bi te re dipeyivim, bêhna miraran ji lingê te tê. Bi vî lingê genî

çênabe ku tu here meqamê çêwîş, eyb e. Çawîş wê henekên xwe bi te bike, tu ê piçûk bikevî.«
»Oh tu jî lê, lingê min pir dixwire. Ev jî tê wê manê ku ez ê zû rehet bibim. Cebarê cihê xwe girtiye, xwir elemeta cebarê ye. Ev ne karê te ye, li ser tiştekî din bipeyive.«
Wî dixwest ku Sarê, behsa mêraniyê bike û nav tê bide.
»Baş e, goreke hirî bikişîne ser, hema çawa be gore wê hinekî bêhnê bigire.«
»Keçê bi wê Mishefa Reş tu bi aqil î, lê. Bê kê bîra vê yekê dibir, kuro! Zû ji min re gorê bîne û bila devê te jî hîç nesekine.«
Temo bi hefsarê bergîlê girtibû û di nav pirikê de sekinîbû. Bergîlê her ji bêhnikekê simên xwe li erdê dixistin, pirik li derdorê belav dibû.
»De ka wê bergîlê hinekî ber bi dikê de bîne, ku dîsa pîra diya te qerfên xwe bi me neke. Bi rastî ku ne ji pîrê be halê min tune ye. Pîrê xeleka navbera hindur û derve ye. Ez bi hinera aqilê wê incex dikarim xwe li tena bigirim.«
Ruyê Sarê bi van gotinan mîna gulekê vebû. Devê wê bihustekê ji ser hev çû. Zor da xwe ku nekene, lê dîsa jî hinekî teriqand. Kitana xwe da ber devê xwe û bi haweyekî kubar got:
»Devê te xweş be pîro. Hinekî bilezînin rêya we dûr e« û girikeke penêr û hefsarê bergîlê da dest Heso.
Kîsekî çapanî di dest Hemo de bû. Çarox girêdabûn û qundera xwe jî
136

xistibû kîs. Bêqapût bû.
»Ew çi kîsê di destê te de ye birazî?«
»Qundera min tê de ye apo. Bi xêr gava ku em gihan Stilîlê, ez ê çaroxan deynim qunderê girêdim û derkevim himber çêwîş, da bizanibe em ne

mirov in hov in; bi çavên maqûlan li me binere û hinekî bi terbiye bi me re bipeyive...«
Ew hîn wilo diaxivî, Sarê bêhnçikyayî bazda hindurê malê. Hilmek ne çû, ji hindur derket. Kurkê Heso û çefiya wî li ser milê wê bûn. Du şev berê gava Heso bi kurk derketibû hewşê guh dabû ser qaçaxçiyan û di nav pirikê de ketibû, kurk di heriyê de mabû. Sarê kurk ne şûştibû. Di devê deriyê hewşê de giha Heso.
»Lo lo pîro, hey te xwelî li serê min kiro, ma tu ê çawa di vê qir û qefalê de bêkurk bide ser rêyan!..«
Heso û Hemo bi rê ketin. Sarê jî taseke av bi dû wan de rijand. Heso henekê xwe bi aqilê wê kir:
»Pîrê tasek hindike, satilekê birijîne ku oxira me tam hilê. Howeh ev pîrek çiqasî bêaqil in!«
Ro tibabekî bilind bûbû. Mija ku berî niha bi seetekê her der nixu-mandibû, belav bûbû. Ewr li rajorê çiyê di ser hev re diqulipîn û ber bi deştê de digindirîn. Reşêle û qijakan xwe berdabûn ser sergoyan. Xortan xefk li ber wan vedabûn. Hinekan jî li ser sêncan şaqûl vedabûn. Zarokan kincên xwe ên herî xweşik li xwe kiribûn; di gasînên gund de wek kulîlkên biharê rengareng xuya dikirin. Garankî dabûn dû hev, heryek kîsikek di destê wî de bû û mal bi mal li şekirê sersalê digeriyan. Pê li destûrên kal û bavên xwe kiribûn. Mê û nêr bi hev re dilîstin, dikeniyan, diterpilîn, diketin, ji kêfa şekir re yekser radibûn ser xwe û bêmefer xwe diavêtin hindurên malan. Derdora devê wan ji şekirê qulqulkî wek sor-ingê dixuya. Hinekan derbikên demaçan berdidan, hinekan xwe li gasî-nan qulopazî dikirin û bi babûtan dilîstin. Qîzên herdu bendan jî xwe berdabûn ser birka gund, bi darên tuyê ve hêlan çêkiribûn. Hinek ji wan ketibûn hêlanê û hinekan jî bi hûrizî dilîst û bi sitiranên evînî diavêtin ber hev. Dilîlandin. Dengê lîlelîlên wan li ser gund belav dibû, agir bi dilê

xortan dixist. Kûçikan li ser bênderan digel hev dilîstin. Yek direviya ên din didan pey wî, yekî xwe diavêt erdê ên din ew li erdê digevizandin. Hin gundî çûbûn ber çem lêmişt didan hev û hin jî li ber dîwaran xwe dabûn berberojkê. Ji dîwarên kelpîçkirî qirşik dikişandin û li ber diranên xwe ên bi zeng dixebitîn. Ava zer bi nav diranên wan ketibû, tif ne dikirin

û dadiqurtandin. Qurmên diranan ji çixarê reş bûbûn. Mîrzoyê mitirb jî daketibû ser bênderên binya gund, birek xort li xwe vehewandibûn û ji wan re li ribabê dixist. Xortan di vê bêhnikê de dijminatî ji bîr kiribûn. Hûto serê govendê dikişand. Lefahiya Hitê di destê wî de liba dibû, çarpîne xwe li erdê dixist û habela qîr didan.

»Ha wilo ha wilo, ez çavên we bixwim xortino. Ji dil lêxînin, îro heye sibe tune ye. Çep çep çep, rast lêxîne, çep vegere, ha ha ha hûr bîde ber, hûr. Mîrzo xurfanî xurfanî, kuro xurfanî lêxe!«

Mîrzo mitirbekî di ser xwe re bû. Xweş dikarîbû govend rakira. Hostê ribabê û govendê bû. Ji reqisvanan fêm dikir. Wî dizanîbû ku gula govendê Hûto ye. Gotina wî ne dişikenand. Li gor dilê wî diçû.

»Hêêê hê hê hê, kezîzerê kezîzer, tu di ser çavên min re wer
Xulam wan memkên te bim, serê memkan dane der
Wek tiriyê Zinarê, nêvî sor û nêvî zer
Tahma memkên te xweş in, wek penêrê nav koçer
Ha ha ha ha....
Lêêêê lê lê lê, kezîzerê kezîzer, kezîzerê lewendê
Te dilê min kemitand, aqil ji serê min sitendê
Keçê were ji nav malan, têx gerdenê bazbendê
Destê xwe di destê min xe, da em xweş bikin govendê

Hêêê hê hê hê, bişewitîne, bişewitîne!..
Oooo, kezîzerê kezîzer, malxerabê de ka wer
Ez nexweş im, bawî me, ji te re dêbêm çar xeber
Eger bi aqilê te keve, ber bi mala me de wer
Xulam wî fîstanê zer, memik di bin de girover
Selewat li navê pêxember!
Allahumesellî alaseyidîna mûhemmed!
Hêê...«
Hûto ji zewqê nepişî bû. Xortan pê re nikarîbû derxista serî. Geh bi milan geh bi sêngê diçûyê. Te digot qey canê wî bêhestî ye. Her aliyekî xwe bi haweyekî dilivand. Mirov dixwest hema bixwe û vexwe û herwiha lê binere. Hûto qeranê govendê bû.
»Mîrzo Mîrzo! Li cîranê biqewimîne, cîranê cîranê...«
138

Mîrzo di cih de sitiran diqulipand û Hûto dîsa lê germ dibû.
Dema ku Heso û Hemo xwe ji gund berdan û ber bi qelêç de meşiyan, êdî herkesî dizanîbû ku wê ev camêr herin Stilîlê gilî. Heso mîna ku ne dixwest kesek wî bibîne, xwe li ser bergîlê qiloç kiribû, dar li ser dêr li bergîlê dixist. Bergîl bi lewk diçû. Zixur ji ber simên wê dipengizîn li tahtan diketin, reqîniya zixuran li newalê dengê çepikan vedidan. Lêmiştvanan mîna ku çerçî bê gund, hemiyan dev ji danheva dar û beran berdabûn û li wan temaşe dikirin. Hemo destê xwe danîbû ser kêleka xwe hişk bi qewlikê demaçê girtibû û di ber bergîlê re dibeziya.
»Lo waaa yabo, yabo, yabo!..«
Heso veciniqî, »Ev wek dengê Temo ye« got û hefsarê bergîlê kişand. Xwest ku bergîlê ragire. Lê bergîl germ bûbû ne sekinî û wî ji nişkê ve li paş xwe nerî. Di vê kêlîkê de qirdê wî, tevgeriyabû. Eger Hemo pê re ne

gihaba, ew ê bi ser lingê xwe ê seqet de ji bergîlê bihata xwar. Belkî di vê carê de ling bişikesta û heta sax ba wilo seqet bimeşiya.
»Hooweh li vê ecêba kesnedîtî! Em çiqasî rast diavêjin, çep dikeve. Em xwe ji beleyan disitirînin, bele pêxêla me bernadin. Tersbavê qirdê min bûye dijminê serê min. Segbav madem tu ewqasî mêr î, de here Circîsko bixapîne û wî di zinaran de werke, hi! Herkes dikare bergîlkan bixapîne, lawê tirê...«
»Apo hinekî bêhna xwe fireh bike. Ji ketina te mezintir bele li pêşiya me hene. Xwe nekufirî ne.«
Gotina Hemo li telê Heso ket. Ruyê xwe tirş kir û destê xwe hejand:
»Çi bele li pêşiya me hene, yabo qurbano! Ez dizanim ku tu qesda çawîş dikî, ez ne zarokê te me. Ez dizanim bê tu çi dibêjî. Ez, kerê Stenbolê berdim ser sûlala çêwîş! Hema çiqase belê wî hebin bila hemiyan bîne pêşiya min, ez bavê xezebê me!..«
Çixare di devê Temo de bû û bi bazdan dihat. Te digot qey ji nav agirê hêtûnê baz dida, ji dûr ve dixaneke gewr ji serê wî diçû. Çifta bavê xwe a dulûle xistibû destê xwe û rextê fîşekan jî berevajî li newqa xwe girêdabû. Li pişta rez giha wan. Bêhn lê çikiyabû. Bi zor hilma xwe berdida û dik-işand.
»Malneketino, ma mirov çawa dikare sîlehê xwe ji bîr bike! Heta bi ke-virên vî welatî jî dijminên me ne...«
Hemo xwe nepixand. Piştî ku got »Ez pismamê te me Temo, ez bêde-maçe narim ser destavê«, wek generalê ku ji dûr ve li şer temaşe dikir, sekinî. Destekî xwe xist kêlekê, ê din jî danî ser qebza demaçê û gotin

domand:

»Demaça map û bi sê cercûrên xwe ve li pişta pismamê te girêdayî ne. Te dît bê ez çiqasî bi tedbîr im, ya.«
Heso çifte û rext ji dest Temo girt û herdu jî xistin situyê xwe. Bi qahr got:
»Me pir li xwe kir dereng« û bi hinc darek di bergîlê de werkir.
Bergîl ji cihê xwe çeng bû û bêserî meşiya.
»Apo apo, hêdî hêdî...«
»Qut bike, bide ber apo û gavên xwe dirêj rade!«
Heso û Hemo pişta rez derbas kiribûn. Gihabûn Zinarê Mêşê. Sirt û sirt diçûn. Temo li ser tahteke bi xincirî rûniştibû. Pişta xwe dabû bê, berê wî ketibû gund. Sarê jî dabû pey şopa Temo û fîşekên wî didan hev. Sarê ji Temo mîna alekê diyar dikir. Lê Temo digel ku lê dinerî, te digot qey wê nabîne, hîç di eynê xwe de dernedixist, pel li çixara xwe ya ku pêçabû dipêça û diponijî. Li dor sih salên wî bû ku tûtin dikişand û hîn jî nizanîbû çixare bipêça. Heta ku çixareke qut û qalind dipêça, du, sê pel diqetandin.
»Temo Temo, hey mala bavê şewitiyo, kuro lawê kûçik were fîşekên xwe bide hev...«
Qurpînî ji dilê Temo hat. Ruyê wî zer gewirî. Ji heyecanê çixare avêt, kîsikê tûtinê li wê navê hişt, rabû ser xwe û wek dînan li dor xwe nerî. Bêhnikekê wilo li ser lingan ma. Dûv re jî mîna ku dinya hemû li ber çavên wî bûbe deşt, êretî da nav xirêm û ber bi diya xwe de bazda.
»Lawê kerê, fîşekên ku te dane erdê ji sed metroyî xuya dikin, fîşekên xwe bide hev. Kuro ma keliz bi min re ye ku tu tê ba min, fîşekên xwe bide hev, weh!«
Fîşek hemû qahweyî bûn. Di nav lat û tahtan de wek xurman diyar dikirin. Xwe bi xwe peyivî:
»Tu çawa li xwe hayî nabî û fîşekên xwe nabînî? Bavê min vê yeka ha

bibihîze, wê ji min re nebêje çi?« û çongên xwe berdan erdê û li ser şilayê rûnişt.
Sarê heta ku gihabû binya rez duwanzdeh fîşek dabûn hev. Heft ji wan yekgule û ên din jî nehgule bûn. Temo mîna teyrê beretan lepên xwe da-da hindurê pêşmalka diya xwe, fîşek hemû di bêrîka qêpût de danîn û bê-gotin ji diya xwe dûr ket. Heso û Hemo tibabekî baş dûr çûbûn. Lê hîn jî ji ber çavan ne ketibûn, reşên wan xuya dikir. Dengê qîrên Temo wek ewran di ser serê wan re diqulipî û di qûntara çiyê de disekinî.
140

Heso ji Hemo re got, »Dîsa çi hewar e! Ev îro çi xezeb bi serê me de ri-jiyaye! Ka binere bê lawê kerê îcar çi dixwaze« û devê xwe ji tifê dagirt bi qahr tif erdê kir.
Tifa wî li ber bê belav bû, peşkên wê li li ser ruyê Hemo ketin. Hemo bêdilî xwe ruyê xwe ji tifa Heso paqij kir û bi bazdan ber bi Temo de çû. Li bayê bezê lingên wî li hev aliqîn, berê wî ket kevirekî mezin bêserî bi ser kevir de heriqî û li erdê veziliya. Dîsa baş bû ku serê wî li kevir neket. Çermê sîvanoka wî a rastê, kaboka wî û herdu kefên destên wî hinekî selixîbûn. Cihên selixî bi xwîn ne bûbûn. Qebza demaçê di xavika teniş-ta wî de çûbû xwar, tenişt êşiya bû. Lê wî li xwe ne kir tiştek, wek çipik rabû ser xwe û bi aliyê Temo de çû.
»Ha pismam, Xwedê xêr bike dîsa çi hewal e?«
Temo sor û mor bûbû. Rivîn ji ruyê wî diçû. Pişta wî ji xwêhdanê şil bûbû, hilmê di porê wî de dida der. Destê xwe avêt hindurê bêrîka qêpût. Bêrîk bi qul bû, fîşekan xwe berdabûn hindurê betên. Fîşek ne dîtin. Di cih de rûnişt.
»Heywax li mala hûran be! Qeda Xwedê bi mala hûran keve!« û bi kul-man li serê xwe xist.

Hemo wek mehkûmê ku çav li eskeran bikeve, ji nişkê ve cefilî! Xwe bi ser Temo de tewand, bi milê wî ê rastê girt, hejand û sivik got:
»Pismam de ka zû bibêje, te ez di mereqê de kuştim. Ma qey mala hûran hin ji me kuştine, hi?«
»Na bavê mino na na, mesele ne ew e. Mala hûran çi kûçik in ku bikaribin me bikujin...«
Xwest bibêje »Hûrî wek pîrekan e« Hemo rê nedayê. Ziq li hindurê çavên wî nerî, li ser qerevîzkan rûnişt û hinekî bi zirt got:
»Naxwe çi? Te ez ji desthilanîn xistim, zû bibêje!«
»Min ji lez û bezan fîşekên çiftê hemû dabûn erdê. Piştî ku min û pîrê me fîşek dan hev«, rahişt guhikê qêpût hilda ku bibêje, »Min fîşek xistibûn vê mîrata bêrîkê«, fîşek lebitîn. Çavên wî wek lempekê vebûn û bi kêf got:
»Wey va di vir de ne kuro!«
Bi yekcarê re qapût ji ser xwe şemirand. Tam di vê navê re du kewan ji wî alî û vî aliyê çiyê avêtin ber hev. Bêhnikek ne çû, çarhawêr kewan xwend û bi hev re ketin hingamê. Dengê qebeqeba wan wek dengê mî-tralyozan xwirîn bi newalê dixist. Te digot qey çiyê dawet girtiye; dar û devî li ber bayê tavan û di nav wê hingamê de mîna ku direqisîn dihe-

jiyan. Temo hertişt ji bîr kir, nema peyivî û guh da ser dengê kewan. Hemo jî li bayê bezê fîşek ji hindurê betên derxistin, qapût avêt nav ke-viran û rehwankî bazda.
Heso kum dabû serê xwe, şefqe li ser kum û çefiya sipî jî li ser şifqê girêdabû. Bi çefiyê û kurkê xwe ê ku ji heriyê belek bûbû ji dûr ve wek şêxê ku di silûkê de istîxfar dianî, li ser bergîlê bêwestan dihejhijî. Canê

wî mîna rêsiyekî li hev geriyabû. Kelaxê wî giran bûbû. Bi zikê birçî çixare ji çixarê pêdixist. Dixana çixarê û penêrê bi sîrik ba pê re çêkiribû. Hewl dida ku bi dizî bayê zikê xwe berde, lê nikarîbû. Metreha bergîlê tenik û bergîl jî zeîf bû. Hestiyên navpişta bergîlê wek pişta mêsî bel bûbûn. Navpişt di kortika qûna wî de tam rûniştibû, ne dihişt ku bê berde. Ba hemû lê dibû qolinc û li canê wî digeriya. Ji nêza dilê wî li hev diket, lê madê wî ne diçû xwarinê. Hîç ne dixwest ku derek ji kelaxê wî biqeliqe. Lê mixabin bergîlê jî hîç bi a wî ne dikir, di cihê xwe de bêhereket ne dis-ekinî; habela lingekî xwe hildida û yek datanî.
»Mesele çi bû? Çi dixwest?« got û nav şeqên xwe xwirand.
Hemo bêhna xwe girt û di bersiva wî de sivik peyivî:
»Fîşekên çiftê ji xwe de xistibûn, apo.«
Heso darek li termaza bergîlê xist, bergîl çeng bû. Piştî ku got »Na lo!« bi lez rext ji situyê xwe derxist û li fîşekan nerî.
Di rext de bi tenê du fîşek hebûn.
»De îcar ji xwe re li vê ecêbê binerin! Kûçik lawê kûçikan dixwaze bi dostayî me têxe xefka Circîsko û me bide kuştin. Howeh kuro, pênc lawên min hene û yek jî li min ne hatiye! Teresan bi ser xalanên xwe ve çûne. Xwezîka hema li diya xwe hatibana. Diya wan hema çawa be, ji çawîş û eskeran natirse. Herpênc jî nezan, kerûgêj, dahbelorî û tirsonek in. Tu dibêjî qey ne ji heyvanê min in, ava min di wan de ne geriyaye.«
»Apo tu neheqiyan li pismamên min dikî. Herpênc lawên te jî mêrxas in. Ma mêrên wek Luqman li ser rûyê vê dinyayê hene gelo? Luqman şêrekî zozana ye.«
Heso di bersiva wî de destê xwe ji nişkê ve bilind kir ku bibêje, »Luqman ne tu gû yî«, bergîl cefilî û lingên xwe dirêj radan. Heso bi ser qûşê de herikî. Hindik mabû ku bikeve, Hemo pê re giha ew zeft kir.
»Kuro îro çi bi vê bergîlê hatiye! Hertiştî bermeqlûbî min dike. Ez wê

disekinînim ew dimeşe, ez wê diajom ew disekine, ez destê xwe hildidim ew dikeve kirê min û lotikan dide. Ne be gelo Sarê şevê din êm nedabe vê
mîratê?«
142

»Heywan e lê negire. Belkî jî tî bûye ji tîbûna van mizuriyan dike.«
Heso hinekî beşişî. Dilê xwe bi xwe şewitand û henekê xwe bi xwe kir:
»Ez kurdûnde me. Wey xwelî li serê min û bavê min be ku ez jî bi law im. Di şeva ku ew çêbûn xwezîka di wan şevan de ez li êş qeraş bûma. Du lawên min xwe li gundê Sirêçkê vezilandine, kî bavê wan bikuje ew li xwe naqewimînin û bi hewara bavê xwe de nayên. Yek ketiye bersêla jina xwe nên dipêje, Circîs hewarê tîne ser bavê wî û ew bi xwe nahise. Yek jê bi gulên lawê Circîsko ji mirinê radibe û cesaret nake ku derbekê di di-jminên xwe ên xwînê de werke. Yek jê rext bermeqlûb li pişta xwe girê-dide û bi gaziya bavê xwe de tê. Ez bêdûnde me. Ez nema dizanim bê ez ê çi bibêjim. Wilehî ne ez û ne jî rebena Sarê em ewqasî ne xerab bûn, lo. Sarê bi wê pîrekiya xwe dikare berberiyê bi temamê vê mentîqê re bike. Eger ji van zarokan hema yek jê bi ser min an bi ser diya xwe ve çûba, îro belkî ez patîşahê welêt bûbama.«
Bergîl bi lez diçû. Hemo dabû dû. Bergîlê çiqasî dilezand, Sitilîlê jî ewqasî nêzîk dibû. Dilê Heso kûr diniqirand, ji tirsan tiktik dikir. Hîç ne dixwest ku dawî li rê bê, ji bo ku çêwîş nebîne. Lê ne dixwest ku rê ewqasî dûr be jî, ji bo ku deqîqeyekê berî deqîqeyekê derkeve hizûra çêwîş; eyarê
Circîs ji pûş û pelaxê binepixîne. Her ku ber bi Stilîlê ve diçûn, tirsê jî ewqasî lê zêde dikir. Wî dil diavêt ku ji dêvla Hemo Sarê pê re ba. Di nav re, bêî ku Sarê bûba dabaş, bandilhewa çêlî Sarê dikir. Ne dixwest navê

wê ji ser zimanê wî bikeve. Her ji bêhnikekê wê gotin bi vir û wir de bigindiranda û di dawiyê de dîsa gotin bizîviranda ser Sarê. Lê Hemo fêm ne dikir. Car caran di dilê xwe de digot, »Ez çi difikirim û ew behsa çi ji min re dike!..«
»Apo me şikefta Kunheftarê jî derbas kir, ha. Bi telaq me qûn li rê qe-tand nîvê bêtir çû. Rêya me hemû hilmek û pifek maye. Apo eyb nebe, ma gelo te îfada xwe hazir kiriye bê tu ê ji çêwîş re çi bibêjî? Ma ne divê ku îfadên me hev bigirin. Ez wek te ne bi aqil û ne jî baş bi tirkî dizanim. De ka min li berxîne ku ez ji xwe re ezber bikim, rêya me hîn pir maye.«
Heso destê xwe avêt bêrîka kurk ku qutiya tûtinê derxîne. Qutî ne dît. Bi lez destê xwe dirêjî bêrîka din kir. Qutî ne di wê de bû jî. Vaca vaca hejiya. Mîna ku mar here bin ji nişkê ve xwe bilind kir û bêkeys destên xwe çep û rast avêtin. Destê wî li bêrîka şerwêl ket, çingînî ji qutiyê hat, lê ew dîsa jî bi qutiyê agahdar ne bû.
»Tu li çi digerî apo?«
»Kuro ez çiqasî li vê mîratmaya qutiya xwe digerim xuya nake. Sarê çi

bi qutiya min kiriye?«
Hemo hema yekser qutiya xwe ji bêrîka qêpût derxist. Çixareke pêçayî xist nav lêvên wî û çeqmaq li ber pêxist. Fitîla çeqmêq kişiyayî bû. Agir xwe çeng kir rîha wî; xwe paş de vekişand û bi zirt got:
»Kuro te ez şewitandim, weh! Ev îro çi xezeb bi serê me de bariyaye, alahûmme ya rebî!«
Peşkên baranê dihatin. Ezmên ji ewran belek xuya dikir. Ewran mîna ku şer bi royê re dikirin, ro xistibûn çembera xwe û bêyefş xwe dadidan ser. Royê yek dahf dida ê din xwe dida ber. Ew hîn wilo yekî din dihat.

Tîrêjên royê qels dihatin xwar. Te digot qey ewran ew di xwe de guvaş-tine, pir cemidî bûn. Heso dirikrikî.
Dîsa bi hêrs got, »Çixareke din bide min!« û destê xwe danî ser dilê xwe. Ba pê re gihabû hev, hûr û roviyên wî werimî bûn. Tesîra wermê xwe dabû jor, jan ji sêngê diçû wî digot qey dil diêşe. Xwîn di sêngê de dike-liya. Xwêhdaneke cemidî bi eniyê ketibû. Eger bayê zikê xwe berdaba belkî hinekî bêhna wî fireh bûbûya û wilo bi zirt neaxiviya.
»Tu dixwazî ez çi ji te re bibêjim bavê mino? Li dor sih salî ye ku tu bi min re tê qereqolan, mehkeman, quzelqurt û mizelqurtan. Eger heta ni-ha tu hînî îfade û mîfadan ne bûbî, hema dev jê biqere wilo bimîne û hew.«
»Tu rast dibêjî apo, gerek ez hîn bûbama. Ez bawer dikim ku min ter-biya te baş girtiye. Lê dîsa jî aqil ji aqilan çêtir heye. Mirov bi hev bişêwire, baş e.«
Heso bêhna xwe hîn tengtir kir. Dixwest ku bi deng bipeyive. Wî çiqasî dengê xwe hildida dengê wî jî ewqasî nizim diket.
»Mala bavê şewitiyo, îro du roj e em li ser ku em ê ji çêwîş re çawa dere-wan bikin, bextê xwe biavêjin, bi Quranê sûnd bixwin û jina xwe berdin, dipeyivin. Ma qey te civîna me a şevê din ji bîr kir? Li ser vê meseleyê em kûr û dûr peyivî bûn. Ma qey tu nizanî derewan bikî? Hema zorî bide derewan û hew. Ha baş bû ku te anî bîra min, binere binere, gerek em ser-
tazî herin hindurê qereqolê û li ba çawîş û eskeran temena xwe hîç xerab nekin! Gava çêwîş ji te pirsî û te dît ku tu ê nikaribî wî bibersivînî, apê min vê pirsê çêtir dizane bibêje. A din, dibe ku ez xwe ji bîr bikim, îcar tu xwe ji bîr neke: Qedexeye ku mirov bi bergîlê û çiftê here hewşa qereqolê.
Cezê vê yekê giran e!«

Gotina xwe di cih de birî, serê bergîlê ragirt bergîl sekinî. Bi lez çifte ji situyê xwe kir, da dest Hemo û bi dizî got:
144

»Binere, aha li serserê şikêrê ye ha! Eger te lê xist, bi telaq wê oxira me hilê û çawîş jî wê hertiştî wek me bike. Û na eger te lê ne xist, ji xwe wî çaxî jî wê mala me bivirite û çawîş me ji vî welatî celî bike.«
Li jora wan kundekî li ser şikêrekê berê xwe dabû royê, pişta wî ketibû wan û hêdî hêdî ji xwe re dixwend. Hemo du fîşekên nehgule ajotin hindurê çifta dulûle. Di ber latekî mezin de çong berdan erdê û li ber kund veteqilî. Kund mîna ku hîç hayê wî ji wan tune bû, xwendina xwe didomand. Çiftê agir pijiqand, olan bi newalê ket. Cefil li temamê teyr û tilûran ket û heryek bi aliyekî de firiya. Hemo bêhnçikyayî erîşî ser şikêrê kir. Kund li dor şikêrê disûrikî, nikarîbû bifiriya. Wî xwe avêt ser, kund bi saxî girt. Gule lê ne ketibûn. Baskê wî ê çepê ji qurm de elem girtibû. Tije sipî bû. Xuya bû, bi mebesta ku xwe ji sipiyan xalî bike xwe dabû ber royê. Hemo, ji bo ku Heso bixapîne û xwe nîşandar rê bide, bi herdu çîqên kund girt û çep û rast kişandin. Kund di nav lepên wî de ji êşa nava xwe dikir wîqe wîq û wî jî bi haweyê ku ji wî dengî zewqê bistîne, hêdî hêdî ew diçirand. Dûv re sê caran li ser hev cendekê wî li şikêrê xist û avêt dera ha.
»Kuro agir bi mala bavê neketo, wî bîne vir ku ez jî îmana xwe kamil bikim!«
Heso bi kêf piştî ku sê caran tif kir kund, çengek perî ji nav sirta piştê rakir avêt erdê û got:
»Hemo hîç mereqan neke, Xwedê li pişta me ye. Oxira me hilat. Çawîş wê di destê me de wek hevirmêşê nerm bibe. Hewce nake tu serê xwe bi tu îfadan biêşînî, tu çawa bibêjî wê çawîş ji te yeqîn bike.«

Bikuştina teyrikekî mîna ku dinya hemû bûbe a wan, serxweş ketin û bêser û ber peyivîn. Hemo jî xwe bi aqil didît û qeşmeriyên xwe bi aqilê pîrekan dikir.
Nêzîkayî li gundê Atxê kirin. Gund di newalê de ye. Çend xanî jê hinekî ji gund dûr di berpala çiyê de û çendek jî tam di sirta çiyê de hatine avakirin. Atxê ji Zorava piçûktir e. Li vî gundî çar bavik hene û herçar jî bi hev re di berberiyê dene. Debara wan bi giştî li ser sewêl û êzingan dibe. Ji salê heta salê hêviya wan ew e ku çiya şîn bê, dar û deviyan bibirin û bifiroşin berîvaniyan; qatix ji devê zarokên xwe qut bikin, kar û berxan bifroşin, bikin pere û wan pereyan jî hemî li devê çawîş, dadger û sawciyan biqelibînin.
Ro ji ewran xuya nake. Bayê reş peşkên baranê dixurbilîne. Ba, dixana ku ji hilorîkên xaniyan derdikeve, nahêle ku bi ser çiyê keve, di newalê de

difetisîne. Mij cih bi cih, ji best û newalan bi ser çiyê de bilind dibe. Silûmên çiyayên omeriyan û ezman ji dûr ve mîna ku gihane hev, her der ezman diyar dike. Baranê bi comerdî erd av daye, bêhna axê ji erdê difûre.
Heso û Hemo xwe ji ser gund dagerandin û di rohilatî gund re meşiyan. Kûçikan xwe berdan pêşiya wan. Kûçikekî jê bi haweyê ku wan bidire, êrîş kir. Hemo kevirek li nav parxwanên wî xist, waqînî pê ket û reviya.
Heso di ber xwe de beşişî, li gund nerî û bi qerf got:
»Terî ji xelkê vî gundî kêm e, heyvanê aqil bê çi ye, di serê yekî ji wan de tune ye.«
»Çima apo?«

»Erê, ma çima ne çima, ma mirov li ser hêlîneke kewê heft mêran ji hev dikuje!«
»Bi rastî ew meseleya kuştina wan çawa bû? Ez di wê gavê de naşî bûm, xweş nayê bîra min.«
»Dirgoyê Evdo ku xwedî jin û zarok bû û sê xortên gund bi hev re diçin nêçîrê. Li çiyê hêlîneke kewê bi yanzdeh hêkan dibînin. Kê ji wan pêşî hêlîn dîtiye, ez ê nizanibim. Herçar li ser ku min pêşî hêlîn dîtiye, hêlîn a min e li hev nakin. Dirgoyê Evdo jî li hersêyan dixe; hêlînê radike û her yanzdeh hêkên kewê ji xwe re dibe. Li ser vê yekê gundî bi çifte û tivingan dikevin nav hev û di şerê pêşî de Dirgo û ji malbata Nihîtan jî Ceblo tê kuştin. Bi dû wê kuştinê de malê hev talan kirin, bertîl dan çawîşê Sitilîlê, hakim û sawciyên Nisêbîn û Mêrdînê û li hev gilî kirin. Hevdu xistin hepsan. Hin ji wan ji gund derketin, bûn parsek. Hin ji wan bi çiyan ketin, bûn eşqiya; dewar û pezên xelkê dizîn û ji terefî esker û xelkê hatin kuştin. Ji xwe re li vê ecêbê binere, zarokên wan ji nêza kîrê hev dimijin û ew jî çend qurûşên ku ji firotina êzingan bi dest dixînin, hemî di berberiyê de serf dikin! Bi telaq çawîşê Sitilîlê bi wan kêf kiriye. Ji bilî pere, hêk û elokên ku didin çêwîş, bi kêmanî her meh pezekî, duduyan jî jê re dibin.«
»Yanî tu dibêjî ev berberiya ku di vî gundî de dibe, hîn ji wan deman de ye?«
»Erê erê. Berberî hemû hîn li ser wê hêlînê ye. Ma bi tenê ev gund, berberiya ku di gundên derdora me û temamê omeriyan de dibe, hemû ya li ser ku golik çima ketiye ziyanan, cîran eloka cîrên dizî ye, gavan di xew re çûye dewar ketine nav rez û pelmêw xwarine û herwekî din. Li
146

gundê Qûzo li ser pevçûna kûçikan sê mêr ji hev kuştin. Ma mirov li ser

ku kûçikan çima li hevxistiye hev dikuje! Li Gurik Mala Çarqulî û Mala Hemê, li ser ku kerê Gemşo bazdaye ser kera Qelşo, vê yekê dikin meseleya namûs û bênamûsiyê û di hev re difirin. Bi tûşa pêşî re sê mêran ji hev digevizînin. Erê niha tu bi qedirê Xwedê kî, ma mirov li ser ku çima kero bazdaye ser kerê hev dikuje, lo! Howeh li ezameta vî Xaliqê mezin, bê ev kurmancên me çiqasî ehmeq çêkirine, wey bavo!..«
Gund derbas kirin, ketin nav çavê xirêm û bi kêş ve hilkişiyan. Bergîl bêqewet bû. Helke helk û fire fir lê ket, zimanê wê kişiya û her ji bêhnikekê tir kirin. Tengaya xaçerêkên xirêm bergîl bêtir ji taqet dixist, dihejhijî û diçû.
»Vê bergîlê bisekinîne ez ê dakevim û bimeşim.«
»Apo çênabe, tu ê bi vî lingê xwe ê şikestî çawa bimeşî!«
»Erê bavê min, ma tu nabînî bê jinik çawa tiran dike! Ma ne eyb e ku ew dibin min de berde û ez jî hîn bikaribim lê siwarêm, hi!«
Li vê herêmê jî, gava mêr li heywanekê siwar bihata û heywanê dibin de tir kiriba, mîna ku wî tir kiribe li ber xwe diket û ji heywanê peya dibû. Û Heso jî mirovekî ku tam girêdayî tradisyonên civakê bû. Bergîlê ne tirek, neh, deh tir li ser hev kiribûn. Heso pir li ber xwe ketibû.
»Lawê berêz, ez ji te re dibêjim, zû vê mîratmayê bisekinîne ez ê jê peya bibim, weh!«
Hemo bergîl sekinand. Rahişt Heso li ser tahtê danî û li kêleka wî rûnişt.
»Ew qesira Hesenê Hecî ye ne wilo?«
»Erê apo.«
»Bêbavo malê qeranekî li ser e. Ji bilî dewar û mewaran li dor sê sed, çar sed pezê wî heye. Kî dizane bê çiqas pereyên wî ên girêdayî niha hene. Xwedê dizane bê çend çewal zêr di xeşîmên qesira wî de veşartîne. Gava ku Xwedê bide mirov, nabêje tu lawê kê yî?«

»Apo ma qey ew jî bêşê nade çawîş?«
»Bi rastî tu carina tam dibî wek zarokan. Ma li vî welatî ê ku bêşê nade çawîş û mawîşan heye ku tu vê gotina zarokî dibêjî, hi! Herçi esker e, rebê me ye! Mirov ji rebê xwe re îbadetê dike û setqan dide. Îcar bêbavo malê kafirekî li ser e, howeh!«
»Helbet wê malê kafirekî li ser be: Navê camêriyê bê çi ye, li ba tune ye. Mêvanan nahewîne. Kuflet ji dew, meyir û nan û pîvazê pê ve tiştekî din naxwe. Sal dizîvire şîveke bi goşt li êgir nakin. Zilam û pîrekan tahma
147
goşt ji bîr kiriye û zarok jî ji xwe nizanin bê goşt çi tişt e. Û berberiyê jî nake. Ê, îcar çima wê dewlemend nebe, yabo qurbano!«
Heso keserek veda û ziq li Hemo nerî.
»Min ewqasî da dû te û van bênamûsên lawên xwe, yekî ji we çiqek di vî zilamî de ne kir. Hûn jî mêr in qaşo. Di dema xortaniya xwe de, li vê birekê malek nemaye ku min dewar û pez jê ne dizî be. Li ser diziyê ez û Sarê em her roj pevdiçûn. Ne bi dilê wê bû. Lê dîsa jî min dikir. Ez mêr bûm û ew jin bû. Jin mahrkiriya mêr e, divabû wê bi a min bikira û dengê xwe dernexista...«
Heso dizî kiribû, lê ne diziya pez û dewêr bû. Çend carekî çend mirîşk û elokên hevalbendên xwe dizîbûn. Sarê pê dihise; vê yekê jê qebûl nake. Ew jî ji mecbûrî diziyê diterikîne. Di eslê xwe de wî ne dixwest wilo biaxive. Problema wî hemû Sarê bû, ne dixwest ku Sarê ji bîra wî here. Ji bo ku mijara wan seraqet li ser Sarê be, wilo bêpîvan diaxivî. Hemo li ber destê wî mezin bûbû û cîgirê wî bû, lê wî Hemo ehmeqekî beredayî didît. Sarê car caran digot, »Eger ev jî wek Heso û Circîs zikreş û aqilşeytanî ba, ev gund ji zû de wê xerab bûbaya.« Hemo bi a jina xwe dikir. Jina wî Zînê qîza Sarê bû û wê jî bi a diya xwe dikir. Sarê bi rêya qîza xwe mezinayî li Hemo dikir. Wê kêfa xwe dianî ku qîza wê, di wî de geriyabû. Ji Sarê re

bi şîr û şekir li hev hatibû. Di rêya zavê re niquteke av bi ser agirê dijminatiyê dadikir. Lê mixabin di eşîretiya wan de, şerm bû ku mêr bi a jinê kiriba. Ji ber vê yeka ha, ev aliyê Hemo ji teref civatê her tim dihat rexnekirin. Civatê car caran bi çavekî piçûk lê dinerî. Wan, pîrek bêrûmet didît û pîrekê jî ev yeka ha bi xwe xweş dianî. Li gor dînê wan Xwedê, pîrek di kelaxê zilêm de fesilandibû û pêşkêşî zilêm kiribû. Ji bo ku Adem pê biwenise ew ji »Bin milê Adem« afirandibû. Civata Heso ji pîrekê re digot, « Ev mexlûq bi tenê ji bo kêfa nav livînan hatiye dinyayê.« Ewr li jora wan li hev diciviyan.

»Hemo ewr li hev digerin, xuya dike ku wê baraneke pir pîs li me bide der. Zû rabe ser xwe. Berî ku baran li me bide der, bi haweyekî em xwe bigihînin serê sirtê. Li wir berpal û berqef hene.«

Heso ne dixwest li bergîlê siwarê. Lê ne dixwest li pişta Hemo jî siwarê. Xwest ku bi çarlepikan bimeşe, ew jî nikarîbû. Ziq li herdu çavên Hemo nerî.

»Îcar em çi bikin bavê mino! Ji te û bergîlê divê ez li yekî ji we siwarêm.« Hemo fêm kir ku apê wî naxwaze li bergîlê siwarê, ditirse ku dîsa ba ji ber wê here û êdî ew jî ji fedîbûna nema bikaribe serê xwe rake. Ji bin tah-

148

ta ku herdu li ser rûniştibûn ji nişkê ve pirtînîyek bi hêl hat, Heso rimekê bilind bû. Gopalê xwe bi hinc li erdê xist:

»Wey mîratmayê, ev te di bin vê tahtê de çi dikir! Hey qeda Xwedê bi te ke ve, ma niha wextê te û firê bû, hi! Te hinavên min qetandin!«

Sûsikek bû. Sûsikê wek tîra ku tu ji kevên biavêjî ji lûs fir da xwe û rast xwe berda newalê. Dengê qurpe qurpa wê heta cihê ku xwe lê danî ji hev qut ne bû.

»Apo heta ku em bi sirtê kevin, ez ê rahijim te. Ez bawer dikim gava em ji xirêm xelas bibin, wê bergîl bi rehetî bikaribe te hilgire...«
Heso bêdilî xwe lê siwar hat. Hemo bi destekî bi hefsarê bergîlê girtibû û bi destê din jî lingê wî ê seqet ji latan diparast. Qapût û çakêt jî ji xwe ne kiribû. Herduyan jî aqil ne dikir ku Heso dikarîbû bi hefsarê bergîlê bigirta. Gava Heso bergîl rapêşî xwe kiriba, wê Hemo jî herdu destên xwe bi hêsanî bilivanda û wê ewqasî ne betilîba. Eger qapût û çakêt ji xwe kiriba belkî rê ewqasî lê zor ne kiriba. Heso xwe bi ser hev de guvaştibû, ji dûr ve wek kefjalekî xuya dikir. Wî digot qey ez xwe çiqasî bi ser hev de biguvêşim, ez ê ewqasî sivik bibim û em ê bê teşqele bi kêş kevin. Xîze xîz bi gewriya Hemo ketibû. Pelxemek wî dihat û yek diçû. Fedî dikir ku bikuxe û pelxemê biavêje. Îcar wek gayê ku kayina xwe bîne, dengekî bi kuf û pif derdixist. Ji xwêhdanê bûbû av. Eger rêya wan hinekî dirêj ba, ew ê ji xwêhdanê miheqeq bişewliqiya. Gavên xwe geh kin geh dirêj ra-didan. Zor dida xwe ku li ser lat û tahtan bimeşe. Binê çaroxan şayik bûn, erd şil û bi pûş û pelax bû, her tim dikarîbû bişemitiya.
Bayê ber baranê peşk dixurbilandin, peşkan mîna tepiskan li ruyê wan dida, agir ji rû diçû. Hawêrdor ewr di ser hev re diqulipîn û beledî vedi-dan. Birûskê li tahtan dixist toz û dûman bilind dibû û bêhna şewt û barûdê difûrand. Deng ji teyr û tilûr û tebayan û tu rihberî ne dihat. Bêhnek ne ket wê navê, ewran çiya nixumand, her der reş xeriqî, çar alî ezman pêket û vemirî. Pêşî bayekî xurt rabû, ba di newalê de li hev qulipî, wek ku li borîzana şer bixîne fîkand û ji nişkê ve baranê da der. Tîrêjên baranê mîna ku di safokê re dihatin xwarê bêqutbir rast xwe berdidan newalê. Hawêrdor ji lat û tahtan peqpeqonkên avê bilind dibûn, dengê camcamk û çepikan didan. Ji serê sirtê binê newalê wek deryayeke bêbinî xuya dikir. Mirov heybet dikir ku lê temaşe bikira.
Heso û Hemo di berpala çiyê de bergîl li ber baranê êretî berdabûn û

xwe dabûn ber berqefekê.
»Ev çi xezeb e îro! Di temamê emirê min de nayê bîra min ku bi vê
149
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

ecêbê baran bariyaye! Niyeta Xwedê xerab e, bi telaq ew ê terizê jî li me bibarîne, lo!«
»Carina ewrên wilo dijwar çêdibin, şap e zû derbas dibe. Bêhnikeke din wê ewr biferikin û baran nema bê. Ha ha binere, li rajorî me ronahî ket ezmên. Baranê jî va ye qut kir. Ma tu ne birçî yî apo?«
»Ma çawa ez ne birçî me, lê
xwezîka hema min bikarîba gepeke ziqûm bixwara« û destê xwe avêt bêrîka êlek.
Xwest ku li seetê binere. Seet li mal mabû.
»Me seeta xwe jî ji bîr kiriye yabo. Lê ez bawer dikim, wê nîvro bûbe. Heta ku tu xwarinê ji me re hazir bikî, ez ê destlimêja xwe bigirim û çend rekhetan bikim.«
Di wê bêhnikê de ne xwedayê rehm û bereketê, ku jê re îbadet bikira, ê zilm û zorê dihat bîra wî. Ne dixwest limêj bike. Zikê wî ji bê nepixîbû.
Bi mebesta ku bê ji ber xwe ber de, limêj dikir mahne.
Hemo bi lez tûrik ji ser bergîlê anî û hema di cih de vekir. Nan ji baranê bûbû hevîr, bastêq bûbû wek nanê şilikî. Nan û penêr ji ava ku ji tûtinê dawerivîbû, zer veda bûn. Rahişt pîvazekê. Pîvaz yeklepî û destarkî bû. Di kefa destê xwe de gerand, bêhn kir, dûv re danî ser kaba xwe û bi hinc kulmek lê da. Navika pîvazê pekiya dera ha, pîvaz perçiqî. Nehişî tiliyên xwe di nên de çikandin, lepeke hevîr bi tiliyan ve hat û bi sê, çar pel pîvaz re ew hevîr avêt devê xwe.
»Ma tu limêj nakî, apo?«

»Na lo, ez poşman bûm, halê me ne besî me ye, tew hîn em ê limêj jî bikin. Dûv re em ê ji xwe re qeza bikin. Dibê qey Xwedê bi xema limêja min e. Ma nabîne ku em di çi kûçkaniyê de ne, hi!..«
Li gor ku dihat gotin, gava Heso di sala 1965an de diçe hecê, Şeytên naricimîne û bêî ku heca xwe bike vedigere malê. Heso li cihê ku hecî Şeytên diricimînin, damara wî a berberiyê pê digire û bi dengekî bilind ji heciyan re dibêje:
»De keviran biavêjênê, de! De wî berdin ser jina xwe, de! Eger wî ne nî ...aba jina we hemiyan, we tif ne dikirê û kevir tê wernedikirin! Min niha fêm kir ku bi rastî Şeytan tiştekî pir mezin û ewqasî jî mêrxas e; ku ewqasî ne mezin û mêrxas ba, wê ev misilmankên ha, bi vê ecêba kesnedîtî nebana dijminê wî, weh!« Qebûl ne dikir ku kesek jê re bibêje »Hecî Heso.« Piştî ku ji hecê vegeriyabû, ev gotina dînî, »Nalet li Şeytên be!« terikandibû û misilmaniyeke li gor xwe çêkiribû.
150

Heso lîçek penêr û pelek pîvaz avêt devê xwe. Bi zorê daqurtand. Gepa duduyan ne xwar û ji nişkê ve bi herdu destan li sênga xwe da.
»Pere pere! Kuro lawo Hemo, ka pere! Min û wê dijminbava jina xwe, me ji bîr kiriye ku ez pereyan bi xwe re bînim. De ka îcar bibêje min, bê em ê çi xweliyê li serê xwe û bavê xwe bikin! Em ê çawa bêpere herin ba dêqahpê çawîş, hi!«
Hemo bi haweyê xulamên axeyên omeriyan, destê xwe li sênga xwe xist:
»Ez biraziyê te me, ma min ê çawa ev meseleya ewqasî mihîm, ji bîr kiriba! ku em devê çawîş tije pere nekin, em ê çawa bikaribin Circîsko li bin guhê erdê bixin! Em ê têxin devê çawîş û tê de bihepişînin heta ku ew jî devê Circîsko tije mîz bike...«

Bêhna Heso hat ber. Ji kêfan re dikir bifiriya. Rîha xwe firkand, çefiya ku li serê xwe pêçabû vekir û rahişt şefqê danî ser çonga xwe. Li nav şeqên xwe nerî û bêhnikekê ponijî. Bêî ku kum ji serê xwe bike serî di kum de xwirand, ji dil keserek veda û di ber xwe de eşheda xwe bi Xwedê û pêx-emberê xwe anî.

»Eşhedûenla îlahe îllellah! Ya rebî tu xefûr û kerîm î. Hertişt ji te eyan û beyan e. Eger te pere neavêtana dilê Hemo û em wilo bêpere bi ser çawîş ve biçûna, ma wê çi bi serê me ne kiriba!..«

Baran ferikiye. Deng bi sirûştê ketiye, hawêrdor teyrik difirin. Dengê wan û xwuşîniya ava ku ji pozê zinaran, co û cobar û berpalan diherike, di xume xuma çem de digihê hev; di qûntarên çiyê de li hev vedigere; wek senfoniyeke dilşewat vedide û di nav perê ewran de difetise. Mij, cih bi cih xwe ji ser çiyan berdide û di newalan de dicive. Bayekî hêwî di sirtê de

dixurbile, mijê dialêse û bi jêr de disûrike. Tam di qorzîbira rohilat û bakur de ezmên sahî vedaye. Hewd di avê de meyane, av di hewdan de dibiriqîne. Di qelîştekên kevir û kuçan re avê daye der; her derî çiyê bûye avtêzanek. Kunmişk fetisî ne. Ji keziyên dar û deviyan bi hemd dilopên avê diniqutin û bi nermî xwe bi nava axê de berdidin. Sirûştê bi vê şapa-ta berî niha beraveke xweş kiriye. Qirş û qal û arava çiyê bi nav çem de avêtiye. Çikçikonk boçikên xwe ên rengînî mîna baweşînkên siltanan vekirine, boçik hêdî hêdî hiltên û datên. Bi kêf ji ser vê tahtê dipengizîn ser tahta din û kubar li dû xwe dinerîn. Mîna ku bi sirûştê re ketine eşqê, nikilên xwe di erdê de dibin û tînîn û xwe vedipejinînin. Beraşe li hewa dilîzin. Teyr nizm difirin. Li dera ha kundekî xwe li ser qûçekê daniye û bi haweyekî kemlan li hawêrdora xwe temaşe dike. Wîqe wîqa roviyekî ji

dûr tê. Pêjina guran nayê. Xuyay ye ku keroşk hîn ji mexelên xwe ranebûne. Ji çiyayê himber nêrkewekî qert li dor xwe dizîvire û bi haweyekî serxweçûyî bêwestan dixwîne. Gava pişta wî dikeve newalê, dengê qebqeba wî, di newala din de digere û wek dengê gîtarê belav dibe.
Dema berê wî dikeve newalê, îcar mirov dibêje qey komeke derwêş li ser serê çiyê li erbanê dixînin, wilo deng dide.
Heso, destê xwe dirêjî gopêl kir û bi qahr got:
»Xwe bide ser hev da berî baraneke din li me bide der, em xwe bigi-hînin wî bênamûsê çawîş. Me ji Xwedê fêm kir, mêrik hevalê mêro ye. Lawo wileh zilm e, lê em çi bikin! Ma mirov di vê roja ku teban nikarin ji qulên xwe derkevin, ji mala xwe derdikeve, hi! Kuro hirç, keftar, gur û beraz çi ne li ber me! Tebayên herî mezin, em bi xwe ne! Howeh li vê ecêbê, me tiştek ji vê heyata xwe fêm ne kir û ne kir! Ez ê bazdim ser xwe-ha Circîs, Circîs jî wê bazde ser xweha min, çawîş û temamê eskeran jî wê bazdin ser xweha min û wî! Tu dibînî bê çi xweş e, ne wilo! Lawê Şûtiko nikare bibe zilam û dev ji berberiyê berde. Bi kuştina wî incex em ê bikaribin ji esker û qomandar û çawîş û mawîşan xelas bibin...«
Dilê Hemo bi halê wî şewitî. Bi qewlikê demaçê girt eciqand û xwe bi ser hev de qiriçand:
»Ma tu dibêjî ez wî bikujim? Erê hema destûrê bide min û hew. Hi ihi ez ê niha herim wî saqoçermî bikim!«
Heso bi haweyê ku bê min çi xwelî li serê xwe kir min wilo got, axivî:
»Lo bavo tu jî lo, de heydê bi rêya xwe de, heydê...«
Tibabê du kîlometroyan rêya wan mabû. Lê ji ber ku Sitilîlê di hindurê newalê de bû, hawêrdora wê bi çiyan rapêçayî bû û ew jî ne di rê de dimeşiyan, rê ji du kîlometroyan zêdetir bûbû. Di berpala çiyê re

meşiyan, xwe ji berpalê bernedan û berpal û berpal çûn heta ku gihan nav
bexçeyên sitilîliyan. Piştî ku çem derbas kirin, li hindama mala Şaqûlo rawestiyan. Navbera mala Şaqûlo û qereqolê li dor du sed metroyekî hebû. Hemo bergîl sekinand, qapût ji xwe kir da dest Heso û rahişt kîsikê ku qundera wî tê de bû. Pala xwe da darê, şemitî. Lê dîsa pala xwe dayê. Li ser qerevîzkan bi lez çarox ji lingên xwe kirin û qundere girêda. Qundere û goreyên di hindurê qunderê de ji baranê şil bûbûn. Lingên wî bi zor diçûn qunderê. Demaça xwe, çifta Heso û rextê wî di şemedanê de pêçan, kir kîs û kîs di nav sêncên diriyan de veşart. Heso ji serma ku xwaribû û tirsa çêwîş, dilerizî. Devê wî ketibû hev. Ji bo ku Hemo vî aliyê wî nebîne, kuxuya, serê bergîlê berda û lingên xwe li newqa wê hejand.
152
»Apo apo bisekine!..«
Apo nesekinî. Hemo di hewşa qereqolê de gihayê.
Nobedarê qereqolê pêrgî wan hat. Du, sê metroyan ji wan bi dûr xwe berda ser kabokan, berê tivingê xist zikê wan û bi hêrs got:
»Hûn kî ne? Zû destê xwe bilind bikin û navê xwe bibêjin!«
Bergîl ji deng û keft û lepta ê esker cefilî û bêserî li hewşa qereqolê li hev doç bû. Ji ber ku axavtina bi kurdî li qereqolê û cem eskeran qedexe bû, Heso bi tirkiyeke xwar qêriya:
»Lawo Hemo, apo bergîl ket!« û serdevkî di bergîlê werbû.
Ew li erdê veziliyabû, ay û ûya wî bû û Hemo jî hîn destê wî li hewa û di temenê de ziq li ê esker dinerî.
Heso êşiyabû. Gopalê wî di zikê wî de çûbû, hinav eciqîbûn. Di esasê xwe de, ji vê bûyerê dîsa jî sivik filitîbû.
»Qûnekê heram, zilam ketiye, zû here wî rake!«
Ê esker her çiqasî bi zirt digot »Here wî rake!« Hemo hîn bêtir xwe bi

ser hev de dişidand û destên xwe bilind dikirin. Ewqasî bi tirkî nizanîbû. Jê werê ku wî çiqasî destên xwe bilind bikirana, ê esker jî wê ewqasî bi nermî pê re biaxiviya. Ji xwe çakêt lê teng bû, îcar baran jî lê hatibû. Ev hemû ne bes bû, tew bi ser halan de bişkok jî girêdabûn. Çakêt tam lê ziqziqî bû, zendên wî rast ne dibûn. Çakêt qutik hildabû jor, serikê dûçi-ka qûnê bêsitar mabû. Di halekî pir ne xweş de bû. Lê şensê wî baş geriya, ji hindurê qereqolê bi lez eskerekî din derket. Ê esker li ser bayê rêya xwe şiqamek pê ve zeliqand û ew saxtî kir. Dûv re bi destê wî girt û ber bi Heso de kişand. Piştî ku Heso jî hema wilo li erdê saxtî kir û got »Bêşeref, vî gapîrî rake û werin hindurê qereqolê!« bi bazdan çû.
Dilê Hemo dilerizî. Nehişî li çep û rastê xwe dinerî, nizanîbû bê wê çi bikira.
»Kuro Hemo, Hemo hişê xwe bîne serê xwe! Ev te aqilê xwe winda kiriye, çi bi te hatiye, weh! Rahije min û min bibe hindurê qereqolê!«
Hemo ew bersêngî xwe kir, çû hindurê qereqolê û di nîvê salonê de sek-inî. Li derdora xwe nerî ku cihekî bibîne û Heso li wir bide rûniştandin. Li ber deriyê ku diçû oda çêwîş pênc kursî rêzkirîbûn. Wî bêî ku destûrê ji eskeran bixwaze, destê xwe dirêjî kursiyekî kir. Eskerekî girs î dirêj, jê re
digotin »Fatîh«, pehînek li zendê Hemo xist kursî ji dest pekiya.
»Qeşmer ew kursî ne ji bo we li wir hatine danîn! Hûn kengî wilo mezin bûne heta ku hûn li ser kursiyan rûnin, ha!« û bi serê xwe qorziya salonê işaret kir.
153
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Hemo Heso li ser çementoyê danî û bi bazdan hat li ber Fatîh sekinî.
»Emir bike qomandarê min!« û temene girt.

Deling û serê delingên pantorê wî seranser herî girtibû. Heriya binê qundera wî ser çementoyê lewitandibû. Li gor isûl û adetên qereqolê, ev sûc bû. Bi bergîlê hatibûn hewşa qereqolê, ev jî sûc dihat hesibandin. Baş bi tirkî nizanîbûn, gotinên eskeran bi wan dubare kiribûn esker aciz bûbûn, sûc bû. Bi ser de jî sergirêdayî ketibûn hewşa qereqolê. Ji rêyeke dûr di qir û qefaliyê de hatibûn û pir westiyabûn. Û bedêla her sûcî jî lê-dan û pere bûn. Dixwestin ku esker wan wek xwe insan bibînin û di meqamê wan de bikaribin li ser kursiyan rûnin. Ma ne ji ber vê yekê bû ku Hemo bedil li xwe kiribû.
Eskerekî hûrik bêhnekê li Fatîh nerî. Dûv re berê xwe da Heso, guh da ser halê wî û di dilê xwe de got û biland:
»Rûniştina li ser kursiyê ne tiştekî ewqasî mezin bû. Eger van be-lengazan, ew rûmet ji qada me ya desthilatdar bidîtana, belkî hişê wan bi-
hata serê wan û dev ji berberiya navxweyî berdana. Him ma ne qaşo her-du alî jî misilman in. Yanî pêxember û Xwedayê me û wan yek e. Em jî û ew jî em pev re rojî digirin û difitirin. Cejna me û wan yek e. Em û wan berê xwe didin Mekê û di mizgeftekê de limêj dikin. Ew jî, em jî zekatê didin. Me bi hev re li ingilîz û yûnaniyan xistibû û em hatibûn kuştin.
Me zir dewletek bi qeweta van çêkir. Di şerê Korê de dîsa ev bûn. Kafir û xayinên herî mezin em bi xwe ne ku me ew kuştin û me welatê wan talan kir! Û bi ser de jî qîzên wan jinên me ne. Ji pîrekên xwe ên ku bêisûliyek kiribû re dibêjin, ‘Hesêbî eskerekî bazda ser, xem nake, wê efû bike!’ Ev çi zilm e! Ev çi dîn e! Ev çi ûjdan e! Ev çi heq û hiqûq û edalet e! Ma ne qaşo em misilman hemû birayên hev bûn. Ev dinyaya ‘fanî’ ne a yekî ji me bû. Xwedê dinya ji bo pêxemberê me ava kiribû û ne hiştibû ku ev pêxember sed salekî li vê dinyayê bijî. Seyr e! Ey Xwedê, te çima xwe daye pişt me û tu bi me re pê li van hêsîran dikî! Em di malên wan de li ser

doşekên hirî û zemberîşan rûdinin; zikê xwe ji goştê berx, kar û elokan û birincê dikin pêpîk. Û bi ser de jî em dest dirêjî nav livîna wan dikin! Me bikujin, me heq kiriye!..« û ber bi hindurê qawîşê de lezand.
Fatîh piştî ku kulmek û çar şiqam li dev û ruyê Hemo xistin, dest bi xeberan kir:
»Bênamûs lawê bênamûsan, kûçik lawê kûçikan, zû here wê bergîlê ji hewşê derxîne!«
Hemo bêî ku destên xwe bihejîne û xwîna ku ji bêvilê diherike paqij
154

bike, di temenê de wek pisîkê ji cihê xwe çeng bû û bi bergîlê ve çû. Fatîh madê xwe ê tirş hîn tirştir kir, tifî çep û rastê xwe kir û ji salonê derket. Bêhnek ne ket wê navê, çefiyeke belek ku di xwînê de debixîbû xist destê Heso.
»Gapîr, bi vî paçikî pêşî heriya ser çementoyê paqij bike û dûv re jî bi paçikê ku te li serê xwe pêçabû ziwa bike« û pehînek li termaza wî xist. Heso di nava xwe de dikeliya, lê ew kela wî ne ji ber rabestinên ku ê esker pê re dikir. Di dilê xwe de digot, »Ê ne Circîsko, Xwedê ji min û te re kerîm e, kuştina te bi destê min e« û çefî bi çementoyê ve didewisand. Çefî a Fermanê sitilîlî bû. Çend roj berê gava başçawîş û jina xwe li nav gund digerin, Ferman jî ji dûr ve bi haweyekî balkêş li jina wî temaşe dike. Başçawîş wî dibîne û vê yeka ha bi xwe ne xweş tîne. Wî digire û li wê navê dide ber kulm û şiqaman. Dûv re jî wî dikişîne qereqolê, lê êşkencê dike û çar şev û çar rojan di zindanê de dihêle. Jina çawîş ne pîrekeke ewqasî xweşik jî bû. Bi tenê tilmiqûnên wê girover û mezin bûn. Xweşikbûna wê ji wir dihat. Pantorên teng li xwe dikirin. Gava dimeşiya tilmiqûnan hev disût, serê tilmikan di pantor de dizewirîn, wek du hinaran bel dibûn û hêdî hêdî dihejhijîn. Ferman xort bû û pîrekên bi pan-

tor hîn ne dîtibûn. Li herêmê ji bilî xortan kêm zilaman pantor li xwe dikirin. Xort û zilamên sitilîliyan ji tirsa lêdanê, di her gava ku başçawîş bi jina xwe re li nav gund digeriya, serê xwe dixistin ber xwe, li erdê temaşe dikirin û bi lez kolanên gund diterikandin. Dema ku jina wî diçû qehwa gund, herkesî berê xwe jê diguhert û yeko yeko belav dibûn. Beqalê gund Kermoyê kulek, destek datanî ser çavên xwe û bi destê din jî tişt û mişt dirêjî destê jinikê dikirin. Jinik jî pir gerok bû, roja xwe ji malê bêtir li nav gund derbas dikir. Baş bû ku ewqasî ne dihat gund. Ji destê wê gelek xortan xwe ji gund dabûn alî. Di eslê xwe de başçawîş ji aliyê jinê de ne mirovekî ewqasî dilxerab bû jî. Ji ber ku jinik, bi tena serê xwe li bajaran digeriya. Diçû bendava Nisêbînê seyrangehê. Li bajêr gelek hevalên wê ên dikandar hebûn. Li malên wan radiket. Diçû Mêrdînê. Li wir jî hevalên wê hebûn. Geh li malên wan geh li hotêlan radiza. Lê digel vî haweyî başçawîş dîsa jî hîç tahmûl ne dikir ku xortên sitilîliyan li jina wî temaşe bikirana.
Heso bi qûnkişkê hindurê salonê paqij dikir. Tirsa çend rojan û serma ku bi rê de xwaribû di dilê wî de li hev geriyabû. Mîna ku dendikê şe-beşan biçirisîne, her ji bêhnikekê taximên diranan li hev diketin. Lêv tam bi hev zeliqî bûn û rîha wî wek dara ku pelên xwe biweşîne, diricifî.
155
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Fatîh ji qurm de bi rîha wî girt û xwe bi ser de zirzitand:
»Pîsê heram, dengê xwe hilde û bibêje bê tu çi dibêjî! Tu siqêfan dikî ha!«
»Begê min wilehî ez tu tiştî nabêjim yaho. Haşa, ma ez kî me ku ez ê bikaribim gotinên xerab bi zatekî wek te mezin re bikim. Te tu qisûr ne kiriye begê min. Qisûr hemû ji me ye. Dibe ku me hinekî hûn zivêr kirib-

in, xete ji piçûkan efû ji mezinan, me bibexişîne.«
Bi destê Fatîh girt, kir ku maçî bike. Fatîh destê wî heliqand û xwe jê vekişand.
Heso li ber xwe neket. Dîsa situyê xwe jê re tewand û lingê xwe ê seqet işaret kir:
»Aha binere begê min, lingê min şikestî ye. Circîs Aslan« û di cih de sekinî.
Soza ku şevê din bi Sarê re dabû hat bîrê. Fikirî û fikirî û da ber hev. Aliyekî wî yî pêxemberî hebû. Çawa ku pêxember, xelîfe, siltan û qiralên dinyayê jî gava diçûn şer, jin bi xwe re dibirin; ji zewqa ku jinê dida wan bêhnfireh dibûn û serast biryar didan, Heso jî wilo fikirîbû. Ji bo ku bizanibe Circîs çûye gilî an na? bi Sarê re raza bû. Jê re soz dabû ku Circîs ne çûba qereqolê û gilî lê ne kiriba, wî jî wê ji vê hatina xwe re rêyek bidî-ta û behsa pevçûna doh ji eskeran re ne kiriba. Piştî ku di dil xwe de got »Na na, ew hatiye vê qereqolê û gilî li me kiriye, ma ne Kenêr jî wek min fikirîbû!« û bi ê esker re tevda:
»Begê min, Circîs hinavên min bi lêdanê birîn kirine, ji destê lêdana wî, îro çend roj in min nan ne xwariye; dilê min ji nêza li hev dikeve, ez pir diêşim, pir!..«
Heso, herçi esker bûn xweş nas dikirin. Dizanîbû ku çiqasî xwe ji Fatîh re deyne, gava ku çend qurûşekî nedêyê wê fêde neke. Lêbelê mîna ku vê
yekê hîç nizanibe, dîsa jî xwe jê re datanî.
»Begê min, ê ne te ne dît bê Circîs Aslan û zaroyên xwe û muxtarê gund Bedran Aslan, çi afatî bi serê me de anîn!..«
Fatîh destê xwe di nava wî rakir, bi dengekî bilind û sivik sivik peyivî:
»Kûçik, ev tu çi dibêjî! Circîs mircîs, Bedran medran heywan in, insan in çi ne ev!«

Eger hema bêhnek din Hemo ne hatiba, Fatîh wê Heso bi şiqaman gêj kiriba.
»Lawo Hemo zû pereyan derxîne!»got û xwe dada çakêtê wî.
Bi berstikê girt û bi teqil ew ber bi xwe de kişkişand. Bişkoka jor di
156

qulpikê de şikest çakêt vebû; wî wek zarokan destên xwe di paxila wî de gerandin. Qewlik ne dît. Vê carê jî bi kurdî û bi wahc peyivî:
»Kuro kanîn pere!« û bi herdu destan pêxêla Hemo hejand.
Fatîh bi gotina wî re piştî ku pehînek di pişta Hemo de werkir, hestiyê kefa destê xwe li eniyê xist, serê wî li dîwêr ket. Taximên diranan ji dev pekiyan. Taximê jor bi ser çefiya ku pê salon paqij dikir gindirî û tîtikî xwe palda. Hersê diranên wî ên pêş ji çamûrê xuya ne dikirin.
»Qeprax, ma vir mala te û bavê te ye ku tu bi zimanê kirokî diaxivî, ha!..«
Wî herdu destên xwe bilind kirin û bi haweyekî kelûgirî:
»Pir estexfîrulah begê min! Ez jî nizanim bê çawa ji devê min derket. Min di hizûra cenabê te de pîsiyek kir, min bibexişîne...«
Hemo qewlik li ser taziyê xwe girêdabû. Bi lez ji ser tazî kir û dirêjî destê Heso kir. Qewlik ji çermê gê bû. Zînê qewlik li ser sê taxan bi nexê şi-makirî dirûtibû. Xwêhdanê li qewlik vedabû şima nerm kiribû û şimê di qulikên dirûnan re dabû der. Heso bêmefer qewlik vekir, serê xwe bi ser de bi haweyê ku Fatîh nebîne tewand û destê xwe di nav taxên pereyan de li kaxeta herî piçûk gerand. Pere hemû 2700 wereqên tirkî bûn. Çar kaxet jê pênc sed pênc sed, sisê jê sed sed, pênc jê pêncî pêncî, yek deh û
ên din jî hemû bîst bîst bûn. Pereyekî pir bû. Heso tu carî bi ewqas pere

ne dihat qereqolê. Eger bi rê de bizanibûya ku ewqas pere li ser Hemo ne,
miheqeq wê du hezar jê di bin tahtekê de veşartibana. Bîst wereqe xistin destê Fatîh.
»Aha wilo gapîr were îmanê!»got û çû.
Vî hîn salon derbas ne kiribû yekî din hat. Ev ê ku dihat Cengîz bû.
Heso bi hatina wî kêfxweş bû. Rîha xwe firkand û keniya:
»Ooo Cengîz bey, ev tu li ku derê bû yaho, tu ne xuya bû! Agir bi malê neketo ji sibeha Xwedê de em li vir di vî halê ne xweş de, tu li vir e û tu nayê bi me ve ha!..«
Cengiz bêdeng bêhnekê li wan nerî. Dûv re paniya potîna xwe tam xist defa sênga Hemo û bi dîwêr ve eciqand. Çavên Hemo wek du xarên zindoqî lîstin. Piştî ku şiqamek şelpand patika serê Heso, xwe bi ser de tewand û kire zirte zirt:
»Hûn li gund tivingan berdidin hev ha! Ê ne îşev em ê we bi lêdanê tirek bikin!..«
Heso wek çûkê ku başoke di ser re bifire, xwe melisandibû û ziq li kortikên çavên wî dinerî. Lê ecêbmayî mabû. Di dilê xwe de got, »Haho ev

tirk çi miletekî bêbav e!«
Berî niha bi sih û çar rojan dê û bavê Cengiz ji bajarê Gelîbolûyê hatibûn Sitilîlê. Heso bi mebesta ku lawê wan li himber Circîs bi kar bîne, ew ezimandibûn. Du şevan li mala wî raketibûn. Ew biribûn Nisêbînê û tam 1050 wereqe li wan mesref kiribû. Ji mala xwe bi qedir û qîmet bi rê kiribûn. Cengiz nanê wî pir xwaribû. Car caran pere jê xwestibûn û wî jî dabûyê.

»Cengiz beg, ha ji te re jî bîst wereqe!«
Cengiz bîst wereqên wî heliqandin. Tiliya xwe a girdikê danî ser gwîze-ka qirika wî tilî di gwîzekê de çû xwar û devê xwe anî ber guhê wî:
»Yextiyarê qûnvirik bîst hindik e, pêncî bide min!«
Heso bêkip pêncî wereqe dayê. Cengiz çû.
»Apo, min tiştek ji exlaqê van eskeran fêm ne kir, him pereyan ji me distînin û him jî li me dixin!«
Heso tiliya xwe anî ber devê xwe:
»Hişşş dengê xwe neke, bi a wan bike« û wî hiş ne kir.
»Lawê min, her çi tirk e qahpe. Ma tu ne çûyî kerxanê hîç? Pîreka qahp bêfedî ye. Perda ruyê wê qetiyaye. Him te berdide ser xwe û him jî gava tiştekî te li hesabê wê ne hat, tiliyê diavêje qûnê û ji te re 'qûnekê heram' dibêje. Ev tirk miletekî wilo ye ku şipya dikarin di diya xwe û rûniştî jî di a mirov nin! Pîrekên wan li kerxana Mêrdînê û Diyarbekirê ez pêncî carî şipya berdame ser xwe!..« destê xwe li sênga xwe dixist û bi teqil digot. Di eslê xwe de Heso, li Diyarbekirê carekê çûbû kerxanê, lê tiştek bi jinikê ne kiribû. Jê re »abla« gotibû. Jinik jî perê xwe jê distîne, çend şimikan tê wer dike û wî ji odê diavêje. Ji Sarê pê ve doxîna wî li tu pîrekê venebûbû.
»Lêbelê apo, ma ne Aydin Guzel jî tirk bû. Ew wek melayiketekî bû. Berberî ji nav me rakiribû, destava di axuran de qedexe kiribû. Eskerên wî ji dêvla ku li qaçaxê bigeriyana, îcar di kadîn û axuran de li gû di-geriyan...«
Heso ji dil keniya:
»Erê kuro, ma ne tê bîra te bê wî dêqahpê Circîs li ser cebilê qûna xwe çend caran pere dan! Howeh kuro, ew Aydino bê çi zilamekî baş bû, bi me gû ji axur û maxur û bin sefirne û mefirnan derbasî çalan kiribû. Gava qaçaxçiyan li hidûd dixistin jî, wî gotinek çort bê çi ye, bi me re ne

dikir...«
»Ax ku tirk hemû wilo wek wî qenc û bedew bana...«
158

»Tirk û qenc ha, Aydino ne tirk bû ehmeq! Ew miheqeq ji tuxmê yû-naniyan bû. Ma te hîç eskerekî bedew, xweşik û porzer ditiye? Aydino xortekî porzer û li hevhatî bû. Di qîzaniya xwe de porê Sarê jî hinekî zer bû. Pêxemberê me bi xwe jî hej porzeran kiriye. Yanî Aydin Guzelo bi tirkî peyivî be, wê bibe çi! Ez jî bi tirkî dizanim, îcar ma ez bûm tirk, tu bi qedirê xwedê kî, lo! Circîsko çi be tirk ew in; tuxmê wan yek e...«
Heso hîn di bin tesîra van gotinên xwe ên mêranî de bû, eskerek bi lez derbas bû û hilkişiya jor.
»Hê hê esker efendî, patîşahim, allahê min pere pere!..«
Lê ê esker hîç guh nedayê.
»Apo, ma tu dibêjî esker wê hîn jî bi ser me de bên?«
Xwîn di Heso de geriyabû. Sawa xwe revandibû. Kaxetên bîst bîst û pêncî pêncî ji hev veqetandibûn, xistibûn du bêrîkên şerwêl û qewlik li ser taziyê xwe girêdabû.
Keniya û got:
»Helbet wê bên, pere hene pere! Ji xeynî çawîş tam yanzdeh esker li vê qereqolê ne, ew ê niha yek bi yek bên û destê xwe li ber min vegirin. Ez ê
jî bidim; ji bo ku wan li Circîs tam sor bikim û şerefa wî têxim bin lingan. Şeref û namûs bi pereyan tê parastin, birako. Ma ku ne bi qeweta pereyan
be, em ê çawa bikaribin nehêlin ku di vê qereqolê de esker pê li şerefa me
bikin! Camêrî bi pereyan dibe. Ma te feqîrekî camêr dîtiye? Na, te ne

dîtiye. Feqîr bixwazin jî nikarin bibin camêr. Heta mirov bi pereyan dikare bihuştê jî bikire. Xêr û xêrat bi pereyan dibin. Mirovê ku nikaribe dehî û heqîqan bide, wê çawa di ser pira selatê re derbas bibe, hi? Feqîr nikarin ciwangan bikirin û wan bikin dehî û heqîqe ku li ser pira selatê li wan siwarên û di pirê wernebin. Wey li halên feqîran be!..«
Hemo devê xwe bi gotineke mezin dagirt, wî rê nedayê. Xwêzî di qirika Hemo de ma, ji mecbûrî pala xwe da dîwêr.
»Hemo!«
»Çi ye apo?«
»Niha bi rastî dikeve serê te jî ku mirov li wê dinyayê li ser pira selatê li ciwangan û golik û molikan siwar tê? Mirov li ser bênderê nikare li golik siwarê, îcar wê mirov çawa bikaribe li ser wê pira ku ji devê şûr ziravtir e li golik siwarê!«
»Apo ez xulamê te me dev ji van kufiriyan berde. Em di cîhekî teng de ne, vir ne cihê wê ye.«
»Ehmeqê heram, ku dibêje vir ne cihê wê ye. Ji xwe vir tam cihê wê ye.
159
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Xwedê dev ji vê qereqolê berdaye. Di vir de kî ji Xwedê re çi bibêje jê re dimîne. Çimkî gava te lingên xwe avêt hindurê hewşa qereqolê, melayiketên ku xêr û gunehan dinivîsînin ji ser herdu milên te difirin û tu bi tena serê xwe dimînî.«
Heso wê hîn gelek tişt bigotana, lê ê esker ne hişt.
»Qûnekino hûn çi dipeyivin?»got û kulma xwe bilind kir ku li devê Hemo xîne.
Heso destê xwe ji kulma wî re kir mertal, bîst wereqê di kefa destê wî de ji ê esker xuya kir. Esker kulma xwe danî; bêdeng pere berdan bêrîkê,

wek dînan li dor xwe nerî û bi lez çû.
»Lawê qûndekê ecemî ye, ha. Hîn baş fêm ne kiriye ku bê mirov xwe çawa difroşe. Erê kuro, min sed carî ji te re got ku bazde ser diya Cengiz, lê te bi amin ne kir. Jinikê xwe bi te ve dixwirand, dilketibû te. Eger te bazda ser, îro lawê wê jî wê wilo li serê me ne kiriba. Lawê tirê heyfa ku te
çima baznedaye ser dê, ji me hiltîne!«
»Apo, mêvan bûn. Ma dibû ku mirov bazda ser mêvana xwe?«
»Bênamûs, ku dibê ma dibû! Çawa ne dibû, pêşî gerek mirov di wê mê-vana xwe...»got û di cih de qut kir.
Eskerekî din bi rê de bû. Êdî hedê wî bû biaxiviya. Ê esker hîn sê, çar metroyan ji wan dûr bû, wî destê xwe hilda. Bîst wereqe bi tiliya xwe a girdikê û işaretê girt û dest hejand. Dûv re ji nişkê ve destê xwe danî, avêt bêrîkê û pêncî wereqe derxist.
»Begê min Yavuz, ev jî xelata te ye, min ji te re hilanîbû.«
Yavuz zilamekî dirêj î dagirtî bû. Heso pir jê ditirsiya. Zalim bû.
Carekê di mala wî de bi sebeba ku çima goştê elokê jê re çênekiriye, di tepsika hêkên qelandî û beroşa birincê de tif dike û du kulman li argûşkên wî dixîne. Argûşk ji ser hev diçe û Heso li dor mehekê nexweş dikeve. Û du caran jî wî li qereqolê dixe felaqê.
Yavuz piştî ku qotê serê Heso teptipand û bi qot de tif kir, li ber Hemo çong berdan. Hişk bi berstika wî girt û bi qahr got:
»Lawê qahpikê, ev te hîç ji destê min lêdan xwariye gelo?«
Hemo wek lempa ber bê, di cih de xwîn lê vemirî. Gewde serî ranegirt, sitû xiliya û bi dengekî xeniqî lêv ji ser hev çûn:
»Na begê min.«
Hemo kilkiland.
»Na ha! Ê ne îşev bi lêdanê ez ê di jina te...im!«

Dûv re ji qurm de bi herdu guhên wî girt û hêdî hêdî rabû ser xwe. Her
160

ku wî hildida xwe, Hemo jî wek hêlîna zelore, piç bi piç pê re bilind dibû. Serê wî çar caran li dîwêr xist û hîç jî kirpînî ne ketê.
Piştî ku ji Heso re got:
»Min di Xwedayê te kut...o, ji bo mêrxasekî wek min, ma pêncî wereqe ne hindike, hi!« û kulmek li devê wî xist.
Lêva wî a jor bi kulmê re ecinî. Xwîn jê ne hat. Heso çi pereyên ku di bêrîkan de hebûn kir qefil û bêî ku tiştekî bibêje avêt ber lingên wî. Ji ber ku piraniya eskeran hertiştê xwe bi plan di mista başçawîş de dikirin, Yavuz rahişt du kaxetên pêncî pêncî; wek çixarê pêça û rîha Heso pê şeh kir. Piştî bêhnekê bişkokên pantor ji qulpikan kir, serê qereqopkê xwe derxist pere pê firkand û firkand û berda bêrîka xwe. Dûv re jî ji kezebê elq da xwe û pelxemeke mezin tam di kortika serî de werkir. Pelxem di navbera birhûyan re wek ava cokê bi lez herikî, herdu çavên wî şil kirin, xwe berda ser simbêlan û li wir civiya. Heso pelxem bi zendê xwe ê rastê paqij kir. Ji enîşkê heta ku digiha bazinê dest, pelxemê wek pizana pez xuya dikir.
»Qûngenî bi êvarkî re em ê hevdu bibînin!« nav şeqên xwe firkand û çû.
Li gor adetên eşîrên herêmê, bi haweyê ku esker kir sûcekî mezin bû. Cezê wê jêkirin bû. Li himber vê yeka ha kirpînî ne ket Heso, lêbelê di dilê xwe de jî bêdeng nema:
»Bi kêmanî gerek min bigota, ‘begê min eyb e, têra me li me bixîne û vî tiştê xwe di ser me re nehejîne. Ê bi te ve bi me jî ve heye. Yanî a ku tu dikî mêranî ye?’ Oh tu jî lo, dibû ku li min bida û lingê min ê din jî bişikenanda. Ez tirsiyam. Na, dema ku bi bafîka qaçaxçiyan li tabûra

Nisêbînê yuzbaşî di devê min de mîzt, ez li himber rabûm û min qiyamet rakir! Destekî min şikenand û dîsa jî min jê danexwar. Baş e, çima niha min ew mêraniya ha nekir, hi? Ji xwedayê min re xeber da, min dîsa li xwe ne qewimand. Îcar çi yanî? Bila xwedayê te li ser xwe bixeyidiya, bavê mi-no. Ji tirsa lêdanê mirov çawa dikare xwe ewqasî piçûk bixîne! Na na, ne ez, Circîs piçûk e. Bi telaq eger min bizanîbûya ku wê bi desthilanîna min re, teresan nebûna hevalên wî kafirî, min ê tofan rakiribûya! Lê ez çi bikim ax!..«

Başçawîş li qata jor di meqamê xwe de rûniştibû. Bêî ku van herdu mirovan bi xwe agahdar bike, bi hostayî hertişt ji wir îdare dikir. Di ro-jên ku gundî pevdiçûn, wî jî eskerên xwe li hev dicivandin û planê ku wê çawa bikaribin gundiyan pir bişelihînin û ji şexsiyetê bikin, dikirin.

161

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Şelihandin û bêşexsiyetkirin du pirensîpên qereqolê ên esasî bûn. Gava insan bêmal û pere dibû, manewiyeta wî jî qels diket û li ser tiştekî herî sivik dikarîbû xwe piçûk bixista. Mirovê birçî nikarîbû baş bifikiriya. Lênerînên wî mij û xumamî bûn, rûniştî tiştekî wî î tebût tune bû. Şexsiyeta feqîrnezanan di destê zaliman de wek hevîr rû dida û komu-tanên herêmê jî bi vê yeka ha baş dizanîbûn.

»Apo, min bergîl bir mala Şaqûlo. Wî û jina xwe silav li te dikirin. Dixwazin ku em îşev mêvanên wan bin. Gava ku ez hatim, jina wî dest bi haziriya şîva me kiribû jî...«

Heso bi haweyê ku lê guhdar dikir, bêdeng sekinîbû. Xeyalan mîna ewran girtibû ser mejiyê wî, ewrek diherikî ê din dihat. Ê esker siqêf bi xwedayê wî re kiribûn. Dixwest daqurtîne, lê dikir ne dikir ne diçû xwar. Circîs ji bîr kiribû. Ji kûr û dûr diponijî û giraniya aqilê xwe hemû berd-

abû ser islamê, Xwedê û edaleta wî. Li xwe difikirî. Misilman bû û îbadet ji Xwedê re dikir. Bi xwe re ketibû devjengê.
»Niha bi rastî qey ev Xwedê vê zilmê nabîne gelo?
— Belê dibîne.
— Baş e, çima deng nake?
— Qey îman bi te re nemaye ji ber vê yekê.
— Na, ne wilo ye.
— Ma Sarê û mele Salar jî bêîman in?
— Na, ez bawer nakim. Ew îmankamil in.
— Baş e, Xwedê çima li ser zilma ku esker bi wan re dikin, deng nake?
— Qey Xwedê qedera wan wilo nivîsiye?
— Weh weh, ew insan in baş in û îbadetê ji Xwedê re dikin. Hevalê wî nin. Îcar Xwedê çima qedera hevalên xwe wilo xerab dinivîsîne?
— Bi rastî di vir de tiştek heye.
— Na lo, belkî ji ber ku xweha Circîs e, Xwedê wilo qeder li eniya wê nivîsiye.
Erê wê çima binivîsîne, weh!
— Hertişt bi emirê Xwedê dibe, ma tu ji Xwedê çêtir dizanî? Zêde neçe, ewqas!
— Yanî niha ev esker bi emirê Xwedê li me dixin!
— Erê. Gava Xwedê qebûl neke, ew nikarin li te xînin.
— Yanî niha li nezaretxana Mêrdînê polîsan ew jopên ku dixistin min û di devê min de dimîztin, bi emirê Xwedê bû?
— Erê. Gava Xwedê ew yeka ha bi wan şêrîn ne kiriba, nikarîbûn jop
162

têxistana te.
— Yanî niha insan bi emirê Xwedê çêdibin û dimrin?

— Erê. Hertişt bi emirê Xwedê çêdibe û dimire.
— Naxwe Şeytan jî bi emirê Xwedê bûye Şeytan.
— Erê. Gava Xwedê nexwesta, dikarîbû ew ne kira Şeytan.
— Xwedê Şeytên li himber kê bi kar tîne?
— Li himber insên.
— Baş e, Xwedê çima insên çêdike? Û him wan û Şeytên û him jî wan xwe bi xwe berdide hev? Çi fêda wî tê de heye? Yanî niha Xwedê Circîsko berdide pêxêla min! Ha lawo Hemo, hejmar bû çend?«
»Ez dibêjim heft.«
»Kuro tu şaş î bavo. Gerek ya sisê ya jî bûbe çar. Wilo xuya dike ku ev segbav wê me biêşînin.«
Heso piştî ku ji hecê vegeriyabû di derbarê dîn û Xwedê de gelek caran bi melê gund re devjeng girtibû. Berê jî ev aliyê wî hebû lê ne ewqas bû. Eger di herêmê de hin ilimzanên olnenas hebûna, wê bi rehetî Heso li himber Xwedê rakiribana. Wê demê jî miheqeq dê dev ji berberiyê berda û li tifaqiyê bigeriya.
»Apo, ez dibêjim, gava ku em derketin meqamê çawîş, em ê giliyên eskerên wî jî li ba bikin. Ma tu çi dibêjî?«
Heso li ser hev du dengan kuxuya. Kuxuka wî hinekî hişk bû. Bi sênga xwe girt. Kuxuk dîsa hatêyê, lê wî hewl da ku nekuxe. Serê xwe berda ber xwe û bi dizî got:
»Lawê min, ma kûçik goştê kûçik dixwe?«
»Na apo.«
Piştî ku beşişî, pişta situyê xwe xurand. Dûv re tena tena got:
»Belê belê, gava birçî be dixwe û hey dixwe.«
»Min fêm ne kir.«
»Eger gava ez bikaribim sê, çar hezarekî berdim devê çawîş, ew ê li pêş çavên min di devê eskerên xwe de bimîze.«

»Lêbelê apo çawîş ne mirovekî birçî ye.«
»Tu çiqasî bide insên ew ê dîsa jî çavbirçî be. Insan mexlûqekî derewîn û bêbext e, tu carî têr naxwe.«
»Ma pêxember jî?«
»Erê erê, derewîn û dewlemendên herî mezin ji xwe pêxember bûne. Kafirên ku bi teyaran ezmên diçirînin nikarin xwe bigihînin Xwedê, lê pêxemberan îcar xistine serê van insankên ehmeq ku bi rastî firiyane û

çûne ba Xwedakê wan. Ma ji vê derewê mezintir derew hene gelo! Erê ni-
ha tu çima nabêjî, bê Xwedê doza çi li vî Şeytanî dike?«
Hemo bi destê wî girt, hejand û maçî kir.
»Apo, ez xulamê te bim tu ê bes bikufirî. Di vî cihê teng de û...«
Wî bi qahr destê xwe kişand:
»Kerê çolê, çi cihê teng! Vir tam cihê wê ye. Ma di cehnemê de jî em ê nikaribin bipeyivin, weh! Hayê Xwedêko û pêxemberkê wî, ji ên li cehnemê tune ye. Ew bi ên li bihuştê daketine. Kuro bi telaq heta ku em li vê qereqolê bin, em ji wan re çi bibêjin wê ji me re bimîne. Ma ne ez dev ji wan bernadim, ez ê dilê xwe li wan hênik bikim. Çima ma em ne wek çawîş in ku rojê barek gotinên kotî bi wan re dike û qet jî tiştekî pê nakin! Çawîş!..«
Dengê wî bilind derket. Eskerê hûrik ku dilê xwe bi halê wî şewi-
tandibû, li ber sekinî. Xwe bi ser de tewand, tiliya xwe anî ber devê xwe û got:
»Amca, hişşş!«
Heso bi haweyekî serxweçûyî bi destê wî ê çepê girt û hejand:

»Ha ji te re jî bîst wereqe!«
Ê esker li ber xwe ket. Bi hêdîka destê xwe ji nav ên wî kişand û bêî ku pereyan bigire, bêdeng çû.
»Lawê xanim, hindik dît, hindik! Çima ne sed wereqe bû, ranahijêyê. Erê ezbenî, te Şeytan ji êgir afirand û te ew kir serekê hemû melayiketan. Ev jî çiqasî rast e, ez ê nizanibim. Ez li gor kitêbên te bi te re dikim. Û te Adem jî ji heriyê û zibil û mibil afirand. Bi bafîka ku Şeytan ji Adem re naçe sicûdê, tu vê yeka ha wek bêemiriyê qebûl dikî û wî ceze dikî. Agir wê çawa ji zibil re here sicûdê, ev çi edalet e! Lêbelê ma ne Adem jî bêemiriya te kiribû, te çima ew ceze ne kir? Tu Adem ji bihuştê, mîna ku te ew ceze kiribû diavêjî. Lê tu kê dixapînî! Di eslê xwe de, te rudba Şeytên bi Adem vekiriye. Te insan kiriye hertişt û mezinê hertiştî. Te ji insên cîgir û wekîl ji xwe re çêkirine. Tu wan li melekan siwar dikî û dibî meqamê xwe. Tu ji insên, ên wek Îsa qenc û wek Circîs pîs diafirînî û tu wan berdidî hev. Tu doza çi li insên dikî? Qey te insan ji bo ku pevbiçin û tu jî ji vê pevçûna wan ji xwe re zewqê bistînî, çêkiriye hi?..«
Deriyê ku ji odan dihat salonê hesinî bû. Derî bi boyaxeke renkxwelî boyax bûbû û li ser vê boyaxê jî dîsa bi boyaxa sor ala Tirkiyê hatibû çêkirin. Ji kêşa boyaxê dida der ku boyaxker esker bûne. Cih bi cih şûna firçê beloq dixuya. Pencereke piçûk di derî de bû. Cama wê zere bû.
164

Hema di ser perwaza derî re sûretekî Atatirk î mezin daliqandîbû. Wek vî sûretî mezin sûretekî wî î din jî, ji aliyê hindur ve bi ser deriyê ku li hewşê dinerî daliqandîbû. Herdu Atatirk jî bi cilên eskerî bûn. Atatirkek li ser latekî bilind sekinîbû û bi destê xwe ê rastê mîna ku dijmin işaret bike dirêj radabû û ê din jî li ser hespekî girs î qer bi haweyê ku hicûm bike di hereketê de bû. Hindurê salonê yekser bi boyaxa eskerî hatibû

boyax kirin. Li ser dîwaran bi tîpên mezin hatibû nivîsîn ku tirk firtone ye! Tirk bahoz e! Tirk diperçiqîne! Tirkek himberî dinyayê ye! Wey xwezî bi dilê wî ê ku bibêje ez tirk im! Dîwar bêşibake bûn. Di derî re ronahiyê dida hindur. Ronahiya şikefteke kufarî çiqas bû a vê salonê jî ewqas bû. Ê hoste, miheqeq wê qereqol di hersê çar mehên havînî de ava kiribe. Eger bîr biriba ku ronahiya zivistanê wê tu carî bi qasî a havînê neba, ew ê du, sê kulekên piçûk di vê salonê de vekiribana.
Reqînî bi deriyê salonê ket, Heso bîst wereqe xistin destê xwe, serê xwe rakir û wek mêr li devê derî nerî. Di dadgeha ku wî berî niha ji xwe re danîbû, Xwedê neheq kiribû û berê xwe dabû Circîs.
Mehmetê esker bi zirt got:
»Bênamûsino hûn çi dipeyivîn!« û bi guhê Heso girt.
Guh bi zixur firkand û hey firkand.
»Begê min Mehmet, ha ji te pere pere pere...«
Wî guh berneda heta ku xwîn jê ne hat. Piştî ku vî eskerî pere berdan bêrîka xwe, îcar paşê xwe da wan û xwe daqûl kir. Devê qûna xwe xist devê Heso, xwe bi ser hev de zewirand û tirek berda. Hemo bêhemdî xwe dengekî keniya. Kenê wî li hesabê Mehmet ne hat. Mehmet bi şiqaman êrîşî ser kir. Piştî ku ew bi şiqaman gêj kir, »Tu ê bi min bikenî ha! Heta li min û te bibe êvar!« got û çû.
Heso bi ser Hemo de rabû:
»Bênamûs tu çima keniya? Te çi ji tira wî ye? Bila bin xwe jî tije bike, te çi jê ye? Tu çima dilê wan ji me dihêlî? Ma te ji bîr kiriye bê em ji bo çi hatine vir?..«
Hemo serê xwe berdabû ber xwe, mîna ku bêisûliyek mezin kiribe bêhis û pis guhdar dikir. Di dawiyê de xwe ne girt:
»Apo, bi rastî ma wî ji xwe fedî ne kir ew tişt kir? Ma ne qaşo zilam bû.«
»Kuro ehmeq, me heywan dibînin. Ma mirov ji kerê, çêlekê, ga û ma

fedî dike ku li himber wan tirê neke, hi! Birako, bedilê ku te li xwe kiribû, dîsa jî rê li tira mêrik ne gir, te dît ne?..«
Dengê qelebalixa zarokan ji dûr dihat, te digot qey bi kaban dilîstin.
165
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Yekî rê ne dida yekî, hemû bi hev re diaxivîn. Dengê yekî ji wan li ê hemiya ferq dikir. Mîna ku lawê şêxê gund be, pir bi ser hevalên xwe de hildibû. Çûkekî beytik her ji kêlîkekê xwe dadida ber deriyê salonê, bêhnçikyayî nikil li ser hev li erdê dixist difiriya û dîsa bi eynî meqamî dihat. Tiştekî çêrê jî li wir tune bû. Beton ditiktikand. Bala Heso kişandibû. Vizîniya mêşeke reş û girs bêdengiya salonê xerab dikir. Mîna ku hinera xwe şanî Heso bide, li dor xwe dizîvirî dizîvirî û ji nişkê ve xwe li bin guhê cama derî dixist. Ji camê dipengizî erdê, piştî ku çend saniyan nehişî dimeşiya dîsa dest bi fira xwe dikir. Deriyê ku li hewşê dinerî vekirîbû, wê xwe li bin guhê deriyê girtî dixist. Şûna şiqamên di ruyê Hemo de ji devê derî xuya dikirin. Xwîna bêvilê sekinîbû, bêvil nepişî bû. Cilên wî di xwînê de mabûn. Lê heta ku mirov tam ne çûba ber, xwînê xuya ne dikir.
»Qûnekino, xwe bidin ser hev komutan bang we dike!«
Navbera cihê wan û başçawîş ne ewqasî dûr bû. Bi tenê wê pênc, şeş derencan bi jor ketana. Heso ling nedan ber xwe. Dikarîbû ling bidana ber xwe, ya jî bi nikilkê û dîwar û dîwar xwe bigihanda derencan. Mirov nikarîbû xwe bida ser lingê fikyayî, lê mirov dikarîbû bi qeweta darekî xwe bida ser lingê tehenî û bimeşiya. Doh jî bi vî haweyî xwe berdabû ser bênderên gund û li himber komutanê hidûd li ser pêyan sekinîbû. Heso xwe bi erdê ve kir risas. Wî digot qey ez xwe çiqasî bêhal bixim, başçawîş jî wê ewqasî li min guhdar bike û li gor kêfa dilê min here. Belkî sed carî hatibû vê qereqolê. Di her cara ku tê rû nastîne, karekterê başçawîş û es-

keran bi qasî ê xwe nas dike û dîsa jî xwe li himber wan dixe rewşeke wi-ha. Eger di vê bêhnikê de Circîs li vir ba, ji qayişa wî re miheqeq wê bi tena serê xwe heta meqamê başçawîş bimeşiya. Ji ber ku carekê dîsa wek her tim, komutanê hidûd darîçavê gundiyan, diranekî wî î pêşî û ê Circîs bi tayê naylon bi hev girêdide û serê herduyan hêdî hêdî paş ve dikişîne. Diranên wan ji qurm ve radibin û kipînî jî nakeve yekî ji wan. Li gor wan, gava yekî bigota »ay« ê din mêrxas û êdin jî tirsonek dibû. Bi qasî ku dig-otin, xwîna pezekî ji devê wan hatibû.
Hemo ew li pişta xwe kir û bi derencan ve hilkişiya. Deriyê odê vekirîbû û Yavuz jî di devê derî de sekinîbû.
Başçawîş bi zirt got:
»Wan berde hindur lawê min!«
Di hizûra wî de, Hemo bêhnekê li ser pêyan sekinî. Di cihê xwe de diqeliqî, bi zor xwe li tena digirt.
»Wî kevjalî deyne ser çementoyê û tu jî li ser lingan bisekine!«
166

Hemo:
»Ser serê min begê min!« got û yekser emirê wî anî cih.
Mustafa başçawîş yekî qut î qalind û esmer bû. Mirovekî qûnsîrî û ji serxweçûyî bû. Araqvexwir jî bû. Ji mêşekê bi jahrî diket. Ji gotineke piçûk dikarîbû çewaleke gotin derxista û êrîşî mirov bikira. Heyvanê şexsiyetê bê çi bû li ba tune bû. Başçawîşên ku hatine vê qereqolê hemû jî zirçonên zilaman bûn. Heta piraniya eskerên vê qereqolê jî di tayê başçawîşan de wilo serxweçûyî bûn. Zilmeke bêsînor di serê xelkê herêmê de dikirin. Kesekî nikarîbû gilî li wan bikira. Her çiqasî çend carekî hin maqûl, şêx û axeyên herêmê giliyên wan li ba waliyê Mêrdînê kiribin jî, gilî bêbersiv maye û di dawiyê de van kesan him ji teref fer-

mandarên Tûgayaa Mêrdînê û him jî ji teref yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê û başçawîşan ceze xwarine.
Berê xwe da Heso û li ser hev destê xwe li masê xist:
»Zirto, we dîsa çi gû xwariye! Hûn wek du dewletan bi sîlehên giran ketine nav hev û we hev birîndar kiriye. Ma we ji min destûra şer sitendibû? Ma ne qaşo ez qiral we bûm. Hûn çawa dikarin bêî min şer bikin! Hi, tifî, bênamûs, pîsên heram!..«
Qedeha ku ji şeraba sipî tije bû, hindik mabû biqulipiya. Jina wî hema di kêleka wî de li ser kursiyê rûniştîbû. Bi haweyê xatûnî rabû ser xwe tena tena meşiya, destê xwe li ser masê gerand, çend kaxetên belavbûyî dan ser hev, li Heso nerî û kaxet dirêjî ser masê kirin. Vê jinikê dîsa pantorekî reş li xwe kiribû û xwe nîvtazî girêdabû. Fanêreyekî pêş û paş vekirî, qulqulkî û zere li xwe kiribû. Laşê wê mîna penêrê koçeran sipî bû. Laş û fanêre li hev dixwar. Memikên wê ên mezin û girover wek du hinaran bi hêwana sêngê ve daliqandîbûn. Serikê memikan sitep û qeresî bûn. Şana di coka memikan de mîna ku gul vedabû, sipehiyeke din bi bergeha sêngê dixist, sêng dikir bax û bexçe û difûrand. Lê mixabin gava radibû ser xwe, ew memikên bêhnek berê, bi qama wê a qut ve mîna guhanê bizinan lewliqî bi ser zik de dihatin xwar. Çîmçitikî jî bû. Porê xwe ê reş û gijikî di boyaxa zer de guvaştibû; por kemêl kemêlî bûbû. Ji dûr ve wek tûmê tahliyê dixuya.
Sûretê Atatirk li pişt başçawîş bi dîwêr ve daliqandî û yek jî li ser masa wî çikilandî bû. Ji çarçova sûretê li ser masê ku ji zîv bû, xuya dikir bê başçawîş çendî ji Atatirk hez dikir. Axê bizgûriyan ev çarçove kiribû. Mirêkeke mezin di dîwarê pêşberî derî de bi hosteyî hatibû bi cih kirin. Herçar qiraxên wê bi qeseba sipî nixumî bûn. Di cihekî wek qereqolê û

meqamê komutên de, daliqandina mirêkeke wilo mezin bêisûl dihat. Kî dizane belkî ji bo jinikê bû; belkî jî ji bo ku di mirêkê re li rezalet û perîşaniya gundiyan temaşe bikira û hîn bêtir têketa çav xwe...
Heso bi dengekî lerzok got:
»Begê min, ez şêstî derbas dikim. Di xortaniya xwe de dibe ku min hin gundî êşandibin. Lê bi wî xwedayê mezin sund dixwim, ji sih saliya xwe vir ve hîç nayê bîra min ku min şiqamek bê çi ye, li ebdekî Xwedê xistibe. Em di mala xwe de rûniştî di ser şîvê de bûn û Circîs koma xwe anî ser me,«
Başçawîş dîsa bi şid destê xwe kulmikî li masê xist û çeng bû ser pêyan. Navika wî digiha qiraxa masê. Berê xwe da Hemo û bi zirt:
»Di derbarê bûyerê de tu çi dibêjî bêşeref!«
Hemo jî tam bi dengekî bilind:
»Ben bilmez emce bilir! Ez nizanim apê min dizane« û li Heso nerî.
Bi rastî Hemo mirovekî fêmkwîrî bû, dereng tê digiha. Nizanîbû zû tiş-tan ji hev bifesilîne; gotinan li gor cih û wext bi kar bîne. Ne zilamê siyasetê bû. Berberçî bû, lê her tim jî winda dikir. Sebeba herî mezin ku Heso ew kiribû cîgirê xwe, li girtîgeha Mêrdînê bi salan pê re raketîbû û bi vê girtinê di civatê de cihekî wî î taybetî çêbûbû. Civata eşîrî ew kesên ku li ser kuştina mêran dihatin girtin, mêr û mêrkuj qebûl dikirin û ci-hekî bilind dida wan. Digel vî haweyî Heso dîsa jî ne dixwest ku wî bike cîgirê xwe. Di eslê xwe de dilê wî ji Sadiq re dixwest. Lêbelê ji ber ku Sadiq jî ji aliyê exlaqî de li meseleyan dinerî û li gor wî berberî jî bi haweyê exlaqî ne dibû, Hemo kiribû cîgirê xwe.
»Bêşeref ez bi te re dipeyivim, te çi ji apê xwe ye, tu bibêjî!«
Di bersiva başçawîş de gerek dengê xwe hilnedaba. Denghildan bi tenê heqê Başçawîş û eskerên wî bû. Dîsa bi dengê berê:

»Ben bîlmez emce bilir« û di bin çavan re li Heso nerî.
Pirqînî bi jinikê ket.
»Of of bê çiqasî zana ye, tam wek fîlozofan te dibersivîne Mustafa.«
Heso nuh gotinek wilo dibihîst. Xwest ku jinik gotina »fîlozof« bi car bike, lê jinik ji ken nikarîbû bipeyiviya.
Başçawîş tengizî. Çiqasî got ewqasî hêrs bû, bi qasî ku hêrs bû ewqasî jî dengê xwe hilda. Dilê wî elem, mejiyê wî qetran nisiland û rih xwe di elem û qetiranê de guvaşt. Di qelsaya wî de mezinahiya xwe, di belengazî û
perîşaniya wî de mêrxasiya xwe dît û xwe di ser masê re çeng kirê. Serikê potînê li masê ket, şêla xwe winda kir û devdevkî çû erdê. Qedeha şerabê
168

ber bi Heso de pengizî. Ji qiraxa masê dilopên şerabê li hewa mîna çipikên serûmê zelal dixuyan û hêdî hêdî dihatin xwar. Çend kaxet û qelema wî a hibrînî li ser çementoyê di şerabê de şil bûbûn. Nivîsê li kaxetan vedabûn, lê nivîs dihatin xwendin. Sûretê Atatirk pekiyabû wê navê. Sê derzên qalind ketibûn cama sûret. Derzeke jê di ser herdu lêvan re dirêjî guh bûbû; Atatirk lêvduhêlî pêşkêş dikir.
Başçawîş hîç jî pêwîst ne dikir ku xwe di ser masê re biqevizanda. Masê li şibakê dinerî û Hemo jî di nêzîkî derî de sekinîbû. Navbera wan vala bû. Baş bû ku devereke wî ne şikest, yana wê mehkûmê xwe bi lêdanê bikuşta. Hemo bi şiqaman li erdê zîz kir. Şiqaman di rû de dengê demaçê vedidan, pirûsk ji ber çavên wî diçûn. Dema ku başçawîş di meqamê xwe de rûniştibû, ew hîn jî li erdê diqeliqî û baş bi ser hişê xwe ne hatibû.
»Qeprax hevdu bikujin û werin qereqolê! Erê we çima hev ne kuşt!«
»Wilehî begim, emce bilir.«
Dîsa pirqînî bi jinikê ket. Kenê wê wek ê zilaman bû. Mirov zivêr dibû

ku pîrek e. Şerabê di qedehê de dilîst û dibiriqand. Başçawîş bi lez gulpek lê xist, dilopek bi ser qutikê wî de niqutî. Di bin çavan re li jina xwe nerî, lê jinikê ne dît. Bidîta jî deng ne dikir. Ji ber ku cilên wî, qîza Zero Hedoyê dişûşt. Serê Hemo nîşan girt û çeqmaqê xwe ê zîpo tê firand. Çeqmaq li defa sêngê ket. Destê xwe bêhemdî xwe avêt cihê derbê. Çeqmaq hesinî û giran bû, sêng êşandibû.
»Lawê qahpikê ez bi te re, ne bi apê te re dipeyivim! Bersiva min bide kûçik!« û ber bi Heso de meşiya.
Şiqamek li patika serî xist. Dûv re lingê xwe ê rastê da bin çena wî. Serê Heso wek çûkê ku mirar here, bi paş de xiliya û çavên wî bel bûn.
»Gapîr, tu di ber xwe de çi dibêjî?«
Bêbextî lê dikir, tiştek ne gotibû. Zimanê xwe dirêjî şikeftika devê xwe kiribû, bi herikandina taximên diranan lêv lebitîbûn, ewqas.
Mejiyê Hemo dernixûm ketibû, berevajî kar dikir. Tirkezaniya wî hemû bûbû »Emce bilir.« Di rastiya xwe de bi desthilanîn û hinekî jî bi tirkî dizanîbû. Eger hişê xwe tam bidayê, wê bikarîba çend gotin bigotana. Gelek caran hatibû vê qereqolê, êşkence dîtibû û başçawîş di pirsên wî de bersivandibû. Bi tirkiya wî a îro helbet wê başçawîş tam hêrs bûba û ew pir biêşanda. Çimkî dê wî ev aliyê Hemo wek serhildanekê bidîta û serhildanê jî wê jîr û zanayî bi xwe re bianiya û textê zilm û zorê bihejanda.
»Bilir emce begim!«
169
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Vê carê jinikê bi ken tam da nav. Pala xwe da kursî, sênga wê belbû. Bêî ku destê xwe deyne ser ruyê xwe, »Aman ya rebî, ev çi insan in!« got û kire

tîqtîq.
Şeqên wê bi haweyê ku ji eyar bikevin ji hev vebûbûn. Fanêre bi zor memik hildigirtin. Devê navika di laşê gewr û boz de, mîna reşaya di berfê de tarî dixuya. Zikê wê ê piçûk wek cewdikekî tije av ku tu li ber zarokan deynî, bêwestan dihejhijî. Devê wê bihustekê ji ser hev çûbû, hêsir ji çavan diherikî. Çavan dilîst. Dengê tîqtîqa wê hewşa qereqolê derbas dikir.
Başçawîş piştî ku Hemo bi lêdanê nermijand, gazî berdestkê xwe kir:
»Vî qahpik lawê qahpikan biavêjin zindanê!«
Di hindurê vî wextê derbasbûyî de hîç kipînî ne ketibû Heso. Bi tenê guhdar kiribû. Bêhntengiya xwe ne bi gotinê û ne jî bi qîrkirinê dikarîbû bianiya zimên. Keft û lepta Hemo ew pir aciz kiribû. Dilê başçawîş jê hiştibû û bar li ser giran kiribû. Ma ne ji xwe, ew lepta wî dikarîbû bûba sebebê ku başçawîş xwe biavêta pişt Circîs û feleka herî mezin li serê wî bigeranda. Hemo ben xistibû destê Circîs, bi haweyekî divabû ew ben ji dest bigirta. Pala xwe dabû dîwêr û geft li Hemo dixwarin.
»Gapîr, ma te nizanîbû ku mirov bi bergîlê û çiftê nikare bê hewşa qereqolê? Tu dizanî bê te çi sûcekî mezin kirye, hi!«
»Begê min, wilehilezîm gava ez giham ber devê deriyê qereqolê, min pir zor da xwe ku ez bergîlê ragirim, lê mîratmayê bi a min ne kir û kişiya hewşê. Ez dizanim ku min li himber begê xwe sûc kiriye. Şefqeta te ji nan û avê bêtir ji min û temamê xelkê vê mentîqê re lazim e. Kêmanî ji piçûkan efû ji mezinan, min efû bike.«
Situyê xwe wek gunehkarê ku istixfara xwe dianî li himber tewandibû û xweliya binê zemanan bi serê xwe dadikir. Mirêk tam diket ruyê wî. Çavên wî bi mirêkê diket, xwe tê re didît û dîsa jî ji rewşa xwe tiştek fêm ne dikir. Lê eger başçawîş mirovekî maqûl ba, belkî Heso xwe ewqasî li himber piçûk ne xistiba.

»Vê carê wî efû bike mêrikê min, Mustefê min...«
Destê xwe ber bi Heso vekir û berê xwe da jinikê.
»Xanima min, tu van bêşerefan nas nakî; tu çiqasî rû bidî wan, ew jî ewqasî bêrû dibin. Ev insan in ku ji dola kerê nin. Tu çiqasî ji kerê re bibêjî li sikakê serkulan neke, ew ê dîsa jî bike. Ker ji gotinê fêm nake. Lê gava te
di vê bêhnikê de dar lê xist, ew ê serkulên xwe nêvcî bihêle, bireve û tu carî
jî nema li wê sikakê serkulan bike« û wek êgir ber bi Heso de herikî.
170
Bi rîha wî girt û kişand. Tiliyên xwe wek şûjinê bi kar anîn û di zikê wî de rakirin.
»Hev bikujin û werin vir kûçik. Fîşekê, laşê lawê te şîş kiriye û derbas bûye. Bila we jî lawê Circîs bikuşta û hûn dûv re bihatana vir, kerx-anecî!..«
Heso bi van gotinan veciniqî, çavên wî wek du tasan vebûn. »Çawîş çi zû bi vê pevçûna me hisiya? Kê jê re got? Kî hat vir? Ma ji Circîs pê ve wê kî be?« di serê wî re derbas bû. Di dawiyê de xwe ne girt û tena tena axivî:
»Kê çi ji te re gotiye, çewt gotiye.
Circîs û hevalbendên xwe bi êvarkî re êrîşî mala min kirin. Demaçe berdan me, serê çend kesan jî şikenandin û çûn. Lawê min giran birîndar bûye...«
»We rakir doktor?«
»Na begê min.«
»Naxwe lawê te giran birîndar ne bûye tu derewan dikî, kafir! Qahpê Xwedê!..«
Xwest ku bibêje,»Tam teştek xwîn ji birîna wî hat«, başçawîş ne hişt û bi hinc şiqamek li ruyê wî xist. Heso gêj bû. Bi herdu destan bi ruyê xwe

girt. Bêhnekê wilo sekinî. Navrana şerwêl di nav şeqan de wek balonekê nepixîbû. Şûna çend dilopên şerabê li ser xuya dikirin. Qotê serê wî ê keçel wek petêxê ku keroş bikevêjin û ro bidêyê, di mirêkê re dibiriqand. Jinikê berê xwe dabû mirêkê, bi devê xwe girtibû û dikeniya. Dengê kenê wê bi xîze xîz dihat. Porê wê ji paş ve wek boçika ordeka ku qarçikî bûbe, belawela û temisî dixuya.
»Begê min ez pir diêşim. Eger tu wilo li min bixîne ez ê ji hal bikevim û nema bikaribim biaxivim. Hinavên min ji qolincan di ser hev re diqulipin.«
Başçawîş mîna nêriyekî bi fal li wê navê diçû û dihat û her ji bêhnikekê şiqamek, pehînek di Heso werdikir. Reqe reqa nalên binê potîna wî di hindurê odê de belav dibû û di guhên Heso de digiha hev. Diricifî.
Bi nermî got:
»Ji benda Circîs bi fîşekê tu kes birîndar bûye?«
»Na begê min«, ew bersivand û ji kûraya kezebê hilmek kişand.
Başçawîş li ser lingekî zîvirî, berê wî ket jinikê. Bi haweyê ku bibêje, jinika min ma filîm xweş bû, tu têrzewq bû? serê xwe hejand û çav kirê. Rû bi rû bêhnekê li hev nerîn. Çavan pir vekirî jinik didan dest ku ji mêrê xwe hez nake û heta nefretê jî jê dike. Çavên wê di çavên wî de dilîstin,

mijankan dikutkutand; awiran hezaza mejiyê wî bizmar dikir, lêvên wê diricifîn. Fûrandina hinavan di memikên guh re dabû der, memik sor û mor bûbûn. Dil dikeland bêhn çikiyabû, bêhnê sêng kumişandibû û xwêzî di kortika qirikê de hiştibû. Eger başçawîş ev rewş neguherta û dîsa berê xwe nedaba Heso, xanima wî bi bazdan wê ji hindur derketa.
»Yanî niha ji malbata Circîs kesek birîndar ne bûye ha?«

»Na, begê min. Me bi wan re şer ne kir, heta ku hin ji wan birîndar bibin.«
Bêî ku lêvên wî ji ser hev herin di nava xwe de keniya. Dûv re ji nişkê ve ruyê wî reş û şîn veda, xwe bi ser de tewand û bi rîha wî girt.
»Tu ê sûnd bixwî ku we bi wan re şer ne kiriye, qahp?«
Ruyê Heso wek ê miriyekî vemirî. Ne li bendî ku wê başçawîş dîsa wilo bi zirt pê re biaxiviya. Him bi rastî herka gotinê jî ne ber bi wir de bû. Wî kêfa xwe anîbû ku ji beşê heqaret û lêdanê derbasî beşê lihevkirinê bûne. Vê siqêfa berî niha tesîreke mezin li ser kiribû. Lê her çiqasî başçawîş pê re bi nermî biaxiviya jî gerek wî pişta xwe jê re venekiriba û kêfa xwe bi gotinên wî neanîba. Her cara ku hatibû vê qereqolê, eynî tişt pê re bûbû. Li gor wî bertîlê kevir dinermijand. Û wî bi xwe jî ev yeka ha gelek caran ji Sarê re gotibû, »A ku çawîş ji me distîne navê wê ne bertîl, xerac e. Zilamê bertîlxwir serê xwe ji mirov re ditewîne. Û ê xeracxwir jî serê mirov dixe bin çengê xwe û bi kulman dadiwişînê. Him distîne û him jî li te dixîne. Sarê, keçê tu çima min fêm nakî! Ez bertîlê nadim lawê qahpê, xeracê ji min distîne, weh!..«
Heso gava di civata pizûriyan de rûdinişt, exlaqê başçawîş û eskerên wî baş tefsîr dikir. Lê mixabin li qereqolê jî hemû ji bîr dikir.
»Ma çawa ez sûnd naxwim begê min. Bi dîn û îman, bi Xwedê û pêxember, bi namûs û şeref û hersê telaqên jinberdanê, me bi Circîs û hevalbendên wî re şer ne kiriye. Circîs koma xwe aniye ser mala min û lawê min di hindur de bi demaçê birîndar kiriye. Circîs bûye afat û xezebê bi ser gund de dirijîne. Em ji destê wî nema dikarin li gundê xwe rûnin...«
»Bes e bes!« li meqamê xwe rûnişt û liblibî axivî:
»Ez dibînim ku tu nema wek berê emirê min bi cih tînî...«
»Haşa begê min.«
»Hiş, devê xwe bigire û guhdar bike bênamûsê heram!

Yek, di meha çûyî de gerek te elokek û perê kavirekî ji min re bianiya. Te neanî.
Dudu, gava eskerên min tên gund, hûn qedir û mahrîfetê nadin wan.
172

Û heta hûn wan ji gund birçî bi rê dikin.
Sisê, hûn bi şev lempên xwe tarî nakin, qaçaxçî xwe li ronahiya lempan digirin û di ber gundê we re derbas dibin.
Çar, ji dêvla ku hûn ixbara qaçaxçiyan bikin û ji me re bibin alîkar, tew îcar hûn wan dihewînin malên xwe.
Pênc, we dilê komutanê hidûd Mehmet Bîçer hiştiye. Bîçer li ser bên-deran li hêviya we tibabekî sekinî maye.
Şeş, sîlehên we hene û hûn li sîlehan didin mandelê, sîlehan teslîm nakin.
Heft, hûn bi hev re şer dikin û bi vî şerî hûn min agahdar nakin.
Heyşt, tu bi bergîlê û çiftê tê hindurê hewşa qereqolê û hwd. Ma ez hîn jî bibêjim gapîr, hi?
Neh, we doh şer derxistiye û tu îro tê qereqolê, gerek tu doh hatibûya.«
Başçawîş wê hîn jî bigota, lê Heso xwe di ber re rakir:
»Ez bi xulam begê min, em ji te rûreş in. Lê bawer bike begê min, heftek berê min xwe kar kiribû ku ez bi çend elok û perê kavirekî bi ser te de bihatama, îcar lingê min şikest.«
Piştî ku li jina xwe nerî û qelema xwe avêt nav çavên Heso, bi qahr peyivî:
»Qewad tu di hizûra min de jî derewan dikî! We doh şer bi hev re kiriye û tu îro tê xeberê dide min! Tu nikarîbû bihata lê te dikarîbû qasidek bişanda qereqolê, deyûz!«
Qelem di ser serê wî re xijiqî li dîwêr ket û şikest. Baş bû ku ne qelema

hibrînî bû. Qelema hibrînî biha bû. Serikê wê hemû ji zêr bû. Şêxê Tinatê jê re kirîbû.
»Begê min, doh yekşem bû û di şemî û yekşeman de betlane ye. Tu pir kar dikî, me ne xwest ku em te ne rehet bikin.«
»Ulen Heso, bi rastî tu çavê diya xwe yî, te xweş bersiv da. Lê tu derewan dikî...«
Heso wê hîn bigota û bigota, lê başçawîş jî ne dixwest lê guhdar bike. Ji xwe pêwîst ne dikir ku lê guhdar bikira. Çimkî çawa bixwesta wek wî dibû.
Li gor dîtina Heso û eşîrê ji Xwedê mezintir bi tenê tiştek hebû, ew jî »namûs« bû. Pîrek kiribûn namûs, nahtorî lê dikirin û hîç jî qedir û qîmet ne didanê. Vê eşîrê li ser kufiriyên ku bi Xwedê re dikirin hev ne dikuştin, lê li ser ramûsanekê, carina jî li ser awirdaneke bi kirîn qira hev dianîn. Heso di vî warî de namûsperestekî mezin bû. Di kuştina lawê
173
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Necîmê hûrî de gilî li Hemo hatibû kirin û Hemo jî xwe teslîm ne dikir. Başçawîşê berî vî Hasan Firtina, ji bo ku Hemo xwe teslîm bike jina wî girt û bire qereqolê. Hemo xwe teslîm ne kir. Başçawîş serê wê li gwîzên xist û wilo porkur li herêmê gerand. Hemo dîsa xwe teslîm ne kir. Vê carê jî jinik şilfîtazî li hewşa qereqolê bi darê ve daliqand. Hemo xwe teslîm kir. Wê ji fediya û tirsan digot, »Dest navêtine min.« Lêbelê piştî vê bûyerê bi sê mehekî, Sarê bi destê xwe zarok ji ber kiribû. Pir xwîn avêtibû û ew bi miritî rakiribûn nexweşxana Mêrdînê. Sadiq ev yeka ha bi xwe ne xweş anîbû û xwestibû ku başçawîş bikuje. Heso pê re dixeyide û dibêje, »Xem nake lawê min, ne eyb e, esker kiriye! Ji berê de halê pîrekê ev e. Ew

ne jina min û te ye, jina şêx, axê û esker e. Hîn jî di civatan de tê gotin ku lêvên wê taştiya şêx, memikên wê firavîna axê û nav şeqên wê jî şîva esker
bû. Lê îro şêx û axe ji mazatê ketine, hemû bûye malê esker. Li cihê xwe rûne, şikiriya xwe bîne ku tu zilam çêbûyî û hew!«
Destê Heso ê rastê li ser ruyê wî bû û bi destê xwe ê çepê enîşka destê xwe ê rastê zeft kiribû. Xwînê di ruyê wî de wek tirabêlka navtarên gund reng vedabû. Çavên xwe xistibûn ên başçawîş û li sûretê Atatirkê ku bi dîwêr ve daliqandîbû dinerî. Başçawîş jî digot qey bi rastî li min dinere. Mijankan şelêq girtibûn. Êş û cefa canê wî di çavan re dida der. Çavên wî wek du bizotên êgir sor bûbûn. Xwêhdaneke cemidî bi eniya wî a beş ketibû, diricifî. Rîha wî mîna hejê kidasê meyl palda bû. Bişkoka êlekê qahweyî a jêr vebûbû. Qiraxa qutikê wî ê gewr ji hêla rastê ve li erdê kom bûbû. Gora di lingê tehenî de şemitîbû, lingê wî bêhn dida. Gora li ser birînê sipî û a di qunderê de jî sor bû. Ji qorziya odê wek dara ziyaretê ren-
gareng xuya dikir.
Başçawîş çixare ji çixarê pêdixist. Dixana çixarê bi ser de kulor dibû û ber bi derî de diherikî. Xanimê Samsun, wî Yeni Harman dikişand. Wê her çiqasî kêm pêxistibe jî di kêşên wê de xuya dikir ku ew ji mêrik qalûnkêştir bû. Dimijand, situyê xwe li hev dizîvirand û bi helk berdida. Kêşên wê pir tesîr li ser Heso dikir, ji destê hilmekê dil diavêt. Ji bo ku xanim hema carekê devê xwe têxista devê wî û di dev de hilmek berda, dikarîbû bi Circîs re li hev bihata.
Heso li jinikê nerî û got:
»Begê min, ji ber vê hewala ku Circîs bi serê me de qewimand, em bi ser te de destvala hatin, bibexişîne. Bi xêr em ê çend rojekî din destdagirtî bi ser te de bên.«

Hesoyê ku pîrek tiştekî basît didît, ji xwe fedî dikir li ba rûnişta û lê
174

guhdar bikira, di vê bêhnikê de çiqasî dixwest ku vê pîrekê hema gotinek jê re bigota. Bi gotina wê re belkî bayê zilmê hinekî xwe ji ser bida alî û bikarîba bîstikekê serbest rûnişta. Li jinikê dinerî, Sara wî dihat bîrê. Îcar tam di vê kêlîka teng de ji bedêla ku Sarê pê şêrîn bûba, tew pê tahl bûbû. Cinsê pîrekê di şexsê wê de wek ava goleke genî didît. Avê di ku derê golê de çendî bibiriqanda, ew dîsa jî genî bû. Mîna ku di xewnê de bigere, bêserûber keft û lept dikir û xwe di kaş û newalan de werdikir. Ji aliyekî de can dide ku jinik pê re biaxive, çimkî hêviyeke alîgir tê de didît û ji aliyekî de jî bi vê jinikê re temamê cinsê wê dilewitîne. Kî dizane eger jinikê di vî deriyê teng de gotineke xweş pê re kiriba, belkî di şûna jahra ku bi ser pîrekê de dinisiland, bi temamî hingiv binisilanda.
Lê mixabin xanim bergîlî bû. Wê jî wek başçawîş û Heso heqaret li cinsê xwe dikir. Cinsê wê bi şefqet bû. Heta belkî şefqet bi cinsê wê hebû. Xanim ne didît ku zembereka tarîxê di nav duguliyên wê ên mermerî de, di devê deriyê lewh û mahfûz û di navbera herdu lêvên liqûmî de çikilandîbû. Kayinat li ser kelefên wê ên girover hatibû avakirin. Kelefek erş yek ezman bû. Di qelşa erş û ezmanê wê re melayiket, şeytan û xwedan diherikîn bihuştê. Sênga wê bûbû qada şerê Sikenderê Zilqerneyn. Siltanan di bin siha memikên wê de tarîx nivîsandibûn. Pêxember di nav çayira wê de, ew çayira ku misk û ember difûrand, bi pêlên qeymaxê heyvanê wê serxweş ketibûn û di koşka bihuşta wê de raketibûn. Diranên wê ên birincî aqda tarîxê, çermê wê kaxet, bêvila wê qelem, qetra lêvên wê hi-
bir, zulfên wê ên perî tîp bûn. Di gevzeka wê û xwedanan, melayiket û şeytanan de Sokrates afirîbû. Îsa ji ser menbera di hindurê koşka bihuşta

wê de pekiyabû. Di çavekî wê re ro di ê din re heyv dihilat. Av ji xwêh-dana wê, ba hilma wê bû. Cîhan bi guliyên wê ve daliqandîbû. Mijankên wê bûbûn benê hêlana Emer Heyam. Pira selatê ew burhên wê bi xwe bûn. »Nûr»a ku digotin ji xwîna wê bû; îman di xeleka çaviya erş û ez-manê wê de kom bûbû. Ava kewserê ji memikên wê herikîbû. Lêbelê fêm ne dikir ku çerxa felekê di hindurê bihuşta wê de dizîvirî. Wê bi qîmetê xwe nizanîbû. Helbet di rojekê de ji wê bihuşta wê, dê dilopên xwîn û el-emê rawestin û çemê jiyanê li circîs û hesoyan û temamê kayinatê bide der.
Başçawîş zêde êdî tiştekî ku jê re bigota nema bû. Li jina xwe nerî û bi haweyê ku em derbasî beşê pêkenînê bibin, çav dayê û serî hejand. Jina wî jî bi dengekî dilbijok »Erê erê xweş e« got û rabû ser xwe. Di mirêkê li nav şeqên xwe nerî û memikên xwe firkandin. Gava zendê xwe beştekî di

bin memikan re dirêj dikir, serê memikan wek dûvberanan bel dibûn, ku zend dikişand, sêng û zik û memik hemû dibûn yek.
Başçawîş mîna ku ji miftiyê Enqerê re binivîsîne, rahişt qelema xwe a hibrînî û kaxetek wek bilbizêqê paqij danî ber xwe. Destê xwe bilind kir, li Heso nerî keniya û kaxet hejand. Reqreqa qesebê ji kaxetê dihat.
»Heso axa!«
Ev dengekî xweş bû. Ji xwe ji sibehê de li bendî gotineke wilo bû. Mîna ku dinya keşif kiribe, kêfa wî hat û çeng bû. Serê wî li dîwêr ket. Pelqînî ji dîwêr hat. Lêbelê êşa serî hîç ne hat bîrê û bêî ku tiştekî bifikire devê xwe vekir:
»Kerem bike, begê min.«
»Ma tu dixawazî ez ji te re çawa binivîsînim Heso axa?«

»Ji sawcî û hakimê Mêrdînê re tiştekî wilo çivir binivîsîne ku Circîs û Bedran heta sax bin, di hepsê de bimînin. Circîs ji bo ku hizûra insên xerab bike, çêbûye.«
Temamê lebatên wî bi hev şiyar bûbûn. Ew kelax û mejiyê wî ê berî ni-ha ku ji êş û merezê wek rêsiyekî li hev geriyabûn û di bin giraniya zilmê de bûbûn risas, mîna seetê digeriyan. Devê wî ê çatirî bihustekê vebûbû. Herdu lêvên wî wek qayişa êş veziliyabûn, taximên diranan di bin lêvan re mîna tifika miştaxê dixuyan. Gava diaxivî lêv ne digihan hev, taxim ji kontrola zimên derdiket, kufîniya marekî ji dev dihat.
»Hema wilo, ha?«
»Erê erê. Tu li ser wî abanosî çiqasî xerab binivîsînî di cihê xwe de ye, begê min. Ew ne ji xêra ometa Mihemed re hatiye vê dinyayê. Tecal e, Moskof e, Meqeryos e, Durzî ye..!«
»Yaho Heso axa, bi rastî jî îro tu bi min re, wek wan fîlozofên yûnanî ku bûbûn mamostayê Sikenderê Mezin, dipeyivî. Min nizanîbû ku tu mirovekî ewqasî bi aqil î!«
Heso fêm kir ku fîlozofî çi tiştekî mezin e. Rîha xwe firkand, keniya û got:
»Ez dizanim ku tu ji qenciya xwe dibêjî, lê begê min, bi rastî jî vî mêrikî heq kiriye ha!«
Başçawîş henekê xwe pê dikir û wî jî di vê kêlîkê de henekpêkirin ji bîr kiribû. Wek serxweşan ji serxwe çûbû û dilê xwe tam jê re vekiribû. Bîr ne dibir ku di bêhneke din de bê ew ê çi bîne serê wî.
»Tiving û demaçên wan jî hene, begê min. Ji kerema xwe re wan jî binivîsîne.«
176

Ev gotin li hesabê başçawîş ne dihat. Wî û temamê komutanên herêmê

dizanîbûn ku gundî xwedî tiving û demaçe ne. Di vî warî de li himber gundiyan devnerm bûn. Eger bixwestana, di bîst û çar seetan de dikarîbûn herêmê ji çekan paqij bikin.
Başçawîş piştî ku got:
»Baş e Heso axa, ez ê wê jî binivîsînim« û qurtek li şerabê xist.
Qurpînî ji qirikê hat, xwe bi ser masê de tewand. Du şûşe şeraba sêzdeh derece û yeklître vexwaribûn û hîn jî serxweş ne ketibû. Li gor Heso, ew her tim serxweş bû. Bi rastî jî tîpekî wilo muxbinî bû ku vexwara venexwara wek xwe bû. Li dîktatoran çûbû, hîç guhertin ne diketê.
»Ha begê min, têkiliya Circîs bi qaçaxçiyan re jî heye.«
Başçawîş bi vê gotinê hîn bêtir aciz bû. Wî him qaçaxçiyên herêmê û him jî ên derveyî herêmê yek bi yek nas dikirin. Ne dixwest ku zû lê bite-qîne, lê Heso pir çû bi ser de.
Bi qîr got:
»Heso tu mirovekî tam bêşeref û bênamûs î!« û gazî esker kir.
Emirberiya wî bi giştî Fatîh dikir. Bi gotina wî re wek cin li wir hazir bû.
Dilê Heso mîna pêlên behrê rabû û daket û sêng hejhijand. Dinya careke din bi ser serê wî de xerab bûbû. Qîr û hewaran dê çi qîmet biki-ra. Xwîn lê vemirîbû. Rîha wî wek sîha pozê zinêr dirêj kişiyabû. Qirikê xuya ne dikir. Serê xwe berdabû ber xwe û bêkip sekinîbû.
»Lawê min esker, vî bêşerefî biavêje zindanê!«
Fatîh bi bazinê destê wî ê çepê girt û li ser hev çend serpozik li qorika piştê xistin. Heso serpiştkî veziliya û wî ew wek mirarekî bi dû xwe de kişkişand. Heso li ber xwe ne ketibû, tirsiyabû. Çimkî gava gewdê wî ê belewela di neqeban de werdibû û diherikî, ay û ûy jê dihat. Ji meqamê başçawîş heta bi zindanê bi haweyê ku mirov Heso bi rahiştin daxista, sê, çar deqîqe digirtin. Lê Fatîh ew bi hilm û pifekê gihandibû ber deriyê zin-

danê.
Yavuz li vir sekinîbû. Derî ji zû de vekiribû. Piştî ku pelxemek di ser ruyê Heso de werkir, bi herdu lingên wî girt, »Heydê Fatîh« got û cewdikî firandin hindurê zindanê. Barînî bi Heso ket. Derî xiliqandin û bi lez hilkişiyan. Fatîh di derenacan de terpilî, lê zû bi xwe ve giha, ne ket. »Ê ne ez ê di jina te û hefsed bavê te ...im! Wê qahpika xweha te ez xa-pandim, yana ji zû de ez hatibûm vir! Ê ne ez ê di te û xweha te ...im! Esker esker were li me herduyan xîne!..«
177
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Qîre qîra Heso digiha heta oda başçawîş.
Başçawîş ji ber ku hertişt bi plan dikir, dizanîbû bûyer jî wê çawa rû bi-da. Dizanîbû gava Heso û Circîs di zindanê de bîne ba hev, wê qiyamet rabe û ev herdu mirov dê peya bidin ser pira selatê. Di eslê xwe dê vê carê
jina wî bûbû sebebê vê yeka ha. Di dorê de gelek gundî hebûn, wextê wî ji vî filîmê henekpêkirina îro re tune bû. Komutanî li ên wek Heso û Circîs dikir û ew wek »kerê « didîtin. Û qereqola wî jî tije »ker« bûbûn. Divabû deqîqeyekê berî deqîqeyekê ew kiribana insan. Lê çi fêde, jnikê xwestibû wan bîne ba hev, da ku careke din di zewqê de bifetise. Başçawîş
mecbûr mabû. Nikarîbû dilê xanima xwe li ser gundiyan ji xwe bihişta. Şensê Heso xerab geriyabû. Jinik kêm kêm dihat gund. Doh bi êvarkî re Farisê nisêbînî ku xwediyê dikana pertel bû, ew bi texsiyê anîbû û îro jî wê Celoyê torî ji Nisêbînê bi texsiya xwe bihata ew bibira.
Jinikê wek ku xwestibû bûbû. Başçawîş Heso û Circîs anîbûn meqamê xwe. Heso li cihê xwe ê nîv seet berê çarmêrkî û Circîs jî hema li kêleka

wî a rastê li ser çongan rûniştibû.
Circîs mirovekî hema hema wek başçawîş kwidikî bû. Bi simbêl û bêrîh bû. Çavhûrik û bêvilqulingî bû. Di temenê Heso de bû, lê li ser xwe bû. Berberiya herî bi qirêj dikir û çixare jî ne dikişand. Car caran bêhn dikir û dixist qulên bêvila xwe. Porê wî ne weşiya bû. Heso ji zikê wî ê piş re digot, »Ew kurfê zikê wî hemû ji bênamûsiyê nepixiye.« Bêhnfireh bû, ya jî wilo xuya dikir. Difikirî û digot. Ev aliyê xwe di hizûra komutan û kar-mendan de xweş bi kar dianî. Lê Heso ne wilo bû, gava zivêr bûba hertişt li binguhê hev dixist. Ji bilî vê jî, mirovekî xwenegirtî bû. Tişt di dilê xwe de ne dihiştin. Gava ne cihê wê ba jî, bêhemdî xwe diteriqand. Heta carekê li Nisêbînê li qahwa omeriyan bi dengê bilind gotibû;
»Berekatê bamidî, danê vê sibehê di qelaçê gundê me de qaçaxa xwe veşart, lo. Îcar yabo, dema ku esker pê bihisin û bibînin, wê me bi muxbirçitiyê bi nav bike. Ma niha hûn bi qedirê Xwedê û pêxember kin, çi gunehê me di vê de heye!..«
Aliyekî Heso î din î ku li gor civakê pîs bû hebû: Sînorê erdên xwe bi ser sînorê erdê gundiyan de diqulipand. Circîs jî ev yeka ha dikir. Heso pir xesîs bû. Qulupandina sînoran belkî jî ji vê xesîsiyê dihat. Dizî ne dikir, lê gava ji malê yekî bikira, wî ne digot nekin. Circîs dizek bû. Zaroyên wî jî lê çûbûn. Di rastiya xwe de hema hema gundiyan hemiyan sînorê hev diqulipandin. Ev yeka ha di civaka wan de tiştekî pir şerm bû. Him şerm didîtin û him jî gava firset lê dianîn, texsîr ne dikirin. Circîs
178

her tim selewat didan, istixfar dianî û rojê carekê jî ya limêj dikir ya ne dikir. Kêfa wî pir ji raketina nav livîna jinê re dihat. Belkî jî ev yeka ha ji misilmaniya wî dihat. Belkî jî ji ber ku jina wî xweha Heso bû, bi axetî di-fikirî û li jinikê har dibû. Dibe ku ev rastir be. Çimkî jina wî dixwest ku

mêrê wê jinekê din ji xwe re bîne, bang dikir û digot, »Haho, vî Circîskî ez şewliqandim! Ji bo Xwedê û resûlê ekrem, ma li vê birekê jin qeliyan e ku yek ji wan nayê nabe jina vî kafirî, yasitar!..« Lêbelê Circîs jî ji bilî wê jin qebûl ne dikirin. Pir dixwar û hindik vedixwar. Heso jî tam berevajî wî bû. Gava li qelêç an li xewlecihekî ba, destava xwe a mezin li ser pêyan dikir û lê dinerî. Xelkê herêmê hemiyan pê dizanîbûn. Lê tiştekî wilo li dor Heso tune bû. Ev mirov di civatan de tu carî ji dil ne dikeniya. Kenekî xayinane dikir. Lêv ji ser hev dibirin û diran diqiriçandin. Diranan di dev de wek ên qoqekî rizyayî pir qîç xuya dikirin. Kêm kêm radiza. Gava radiza jî Heso dixist xewna xwe û bi dengê bilind siqêf pê re dikirin. Di havîna sala çûyî de şevekê xwestibû li ser qesirê razê. Di xewa xwe de dîsa dipeyive û siqêfên kotî bi Heso re dike. Baş bû ku jina wî zû pê re digihê, Heso nabihîze. Ji ber vê kêmaniya xwe, havînan di hindur de radiza.

Başçawîş li ber wan çik sekinî û awir di wan de veda. Xwe daqûl kir. Dûv re serê xwe sê, çar caran hilda û danî û ji nişkê ve bi çenên herduyan girt. Serê wan li bin guhê hev xist. Xuya bû ku zimanê Circîs ketibû ber diranên wî, lêva jêr bi carekê ve kişandibû devê xwe. Ji devê wî xwîn di-herikî. Lêbelê qet jî deng jê dernediket.

»Qepraxino, ma vir mala bavê we ye ku hûn pevdiçinin, hi!«

Heso devê xwe tije kir, lê Circîs rê nedayê. Destê xwe ê rastê hilda, mî-na parsekan vekir û bi dengekî melûl û melûl peyivî:

»Haşa begê min, ez belengazê Xwedê kî me ku ez ê bikaribim di vî meqamê bilind de, hema gotineke ne maqûl bibêjim. Ez ê çawa bikaribim bêterbiyeke wilo mezin bikim!..«

Eger Heso bi hêrs negota »Başçawîş, ez dixwazim tu li me herduyan xîne«, wê Circîs xwe di bin lingê wî de bikira pûş û pelax.

Başçawîş dixwest ku ne ew li wan, ew xwe bi xwe li hev xînin. Ji xwe ji

serî de wî ew xwestibû.
»Çima tu dixwazî ez li we xînim?« got û zikê xwe firkand.
Jinik bi vê gotinê aciz bû. Bi qahr rabû ser xwe û çû ber şibakê. Bêsebir bûbû. Dixwest ku bêhneke berî bêhnekê ev herdu mirov asaqan di hev de bikin û ew jî ji van asaqan zewqê bistîne.
179
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Başçawîş zivêriya wê ji ber çibû zû fêm kir. Rabû ser xwe tif wan kir û qêriya:
»Qahpino, xwe ji lêdanê re hazir bikin! Circîs li pêşiya wî çongan berde erdê!«
Circîs wilo kir. Jinik bi bazdan hat li ser kursî rûnişt û bi çavekî birçî li wan temaşe kir.
»Ez ji we herduyan re dibêjim, min çi got hûn ê wek min bikin temam qûnekino!«
Circîs bi dengekî ji xwe razî:
»Temam begê min, eynî wek ku tu dibêjî ez ê bikim.«
Heso ne li bendî lêdaneke wilo bû. Erêkirina xwe bi hejandina serî nîşan da.
»Yek, dudu Circîs rîhê ji qurm de bigire!« Wî pê girt.
»Bikişîne! Ber bi xwe de bibe û bîne û tif ruyê wî bike û tif ruyê wî bike û tif ruyê wî bike û...«
Circîs ser û ruyê wî mîna ku mar pê de verşe, bi tif û girêz û pelxeman seyand. Jinik jî wek bergîla ku hatibe fal, çaralî xwe dikiland û hîre hîra wê bû. Di vê navê re Fatîh bêhnçikyayî ket hindur:
»Komutanê min, herbî û hebîsî bi tivingan ketine nav hev, du sê kes ji hev kuştine û gelek birîndar hene. Ma em mefrezê derxînin?«

Başçawîş piştî ku bi kêf û ken got »Niha pêwîst nake, lawê min hîn zû ye« û dîsa berê xwe da Heso.
»Bi simbêlê wî bigire, ber bi xwe de bibe û bîne û tif ruyê wî bike...«
Wî jî wilo kir. Lê a wî ne tif, ba bû. Ne xwaribû û ne jî vexwaribû. Ziwa bûbû.
»Circîs çep û rast du şiqaman li ruyê wî xîne!«
Wî pir bi şida sê şiqam pê ve zeliqandin.
»Heso dora te ye îcar!«
Wî du şiqam avêtênê, lê herdu jî hema hema wek ê dijminê wî bi şida bûn.
Xanim ricifî:
»Aman allahim, bê çiqasî xweşik e!« û sivik sivik şiqam li kabên xwe xistin.
Di dawiyê de xwe ne girt rabû ser xwe û ber bi qirdikên xwe de meşiya.
»Hesocigim, bêvilê bi jor û simbêlan bi jêr de bikişîne! Hadî hadî!«
Heso wilo kir. Xanim ji kenan lal bû. Li dor xwe zîvirî, zîvirî û li erdê rûnişt. Herdu destên xwe ji pişta xwe re kirin sitûn. Serê wê paş de xiliya
180

gazekê şeqên wê vebûn û zincîra pantor xwe berda. Derpiyekî kitanî û sipî lêbû. Patîka wê bi zor dinixumand. Lê dîsa jî hemû xuya dikir. Firêza patîkê mîna ku şevê din eşêf kiribû, tam beyar bû. Ji ken ziwa bûbû, îske îsk dihatênê. Zikê wê ê tazî di helke helk û îske îskan de wek qirika mêsî difisiya û dinepixî. Ji zewqê, laşê wê mîna dara li ber bayê seherê ji xwe re
û me re dihejiya. Di deşta sêngê de, cotê memikan xwe dabûn ser hev bûbûn zozan û serê memikên wê ên helezî wek du darên guhîjan di zozên de rabûbûn ezmên. Delava duguliyan di ronahiya royê de dibiriqand.

Dil ji ber dikir lavlavk, terbiya mirov xerab dikir. Li ser tewafa hisn û cemala ku di navenda daristana wê de gihabû hev, dîndarê herî mezin jî dikarîbû bûba kafir. Bala Heso kişandibû, ji Circîs bêtir li guhera wê dinerî.
Jinik di zewqê de ji hal ketibû, êdî divabû ev beşê pêkenînê biqediya û dest bi beşê din bûba.
»Circîs rabe ser xwe!«
Rabû ser xwe, di temenê de sekinî û bi hêvî lê nerî.
»Heso dibêje ku Circîs derewan dike. Wî êrîş aniye ser mala min û lawê min bi demaçê birîndar kiriye. Circîs mirovekî fesad, teşqelker û derewker e. Berberiya di gund de hemû ew dike. Ma rast e?«
Circîs bi tirkiyeke têkil kurdî xwe sor û mor kir, destê xwe hejand û bi wahc got:
»Ê hema begim, benden û Heso den derewçîdir, sen de qarisî kerxanede. Temam begim!«
Bi gotina wî re dîsa pirqînî bi jinikê ket.
»Aman allahim, bê çiqasî şêrîn e! Bê çi xweş dibêje of of! De ka dîsa bibêje, bibêje bibêje...« û li wê navê xwe gevizand.
Ji ken çikiya bû. Îcar li sênga xwe dixist û wek serşîrekî bêwestan lingên xwe hildidan û datanîn. Heso lê dinerî û di dilê xwe de digot û dibiland:
»Mala Xwedê ava ku tu di wextê împeretoriya osmaniyan de tune bû. Nebûna te, nahmeteke mezin bû ji bo jar û hejaran. Te yê insan qir kiriba. Na na hema bila heba, wê kîjan siltanî bazda ser vê rûqiraga ha û bi a wê bikira! Tew bi ser de jî navê qîza pêxember Fatimê li xipşê kirine. Ê ne bê çi pêxemberî jê dirije...«
Başçawîş fêm kiribû ku ew dibêje, ji min û wî de heçê ku derewan dike, bila jina wî li kerxanê be. Tiştek li xwe çênekir. Erza wî ne şikenand. Ne ku ne dixwest. Jina wî ji wê gotinê zewq sitendibû ji ber hindê. Gava erza

Circîs bişikenanda, dibû ku zewq û sefa jinikê di ber de bima û heta belkî
181
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

hizûra wê jî xerab bûba.
Başçawîş piştî ku bi dengekî têr û dagirtî bang kir:
»Lawê min Fatîh, Circîs axa rake salonê« û qurtek li qedehê xist.
Lêvên wî ên qalind wek asfincê şerab dimijand, lêv şil ne dibûn.
Bêsimbêl û bêvilşerbikî bû. Birhûyên wî ên qalind, çavên wî ên pisîkî û eniya wî a bel, rû ji bergeh kiribûn. Eger simbêl berdana belkî simbêlan ew qisûr hemû di xwe de veşartana. Lê wî çaxî jî dikarîbû yextiyar xuya bikira.
Fatîh dîsa hat. Bêî ku çawîş ferq bike, awireke bi dilpijokî di jinikê de firand û di cih de çav ji ser guhertin.
»Komutanê min, muxtarê Talatê sersala te pîroz dike. Muxtar du kavir û sê elok anîne, ma ez qebûl bikim û wî berdim?«
Xwe aciz kir.
»Qebûl bike û wî berde! Û heta ku ez meseleya van deyûzan safî nekim, kî hat bila li salonê be, ji min nepirse temam!«
Heso wek evdalekî serê xwe berdabû ber xwe û diponijî. Êşa kelax û qolincên hinavên xwe ji bîr kiribû. Terbiye û exlaq ji xwe hîç erê hîç ne dihat bîrê. Circîs bi emirê başçawîş lê xistibû û tif kiribûyê. Ew ji bo wî ne şerm bû. Başçawîş misilman û dewleta wî jî misilman bû. Û bi dû Xwedê de jî dewlet mezin dihat. Reyisê dînê vê dewletê li Enqerê rûdinişt û mezinahiya wê dipesinand û digot: »Serokhêzê dewletê pêxember û es-
habên wî jî esker bûn...« Destê ku pêxember jê kira xwîn jê ne dihat, es-habên ku jar û hejar talan bikirana, xêr û bereket li dinyayê dibarandin.

Eskeran qîza wî li hewşa qereqolê şilfîtazî kiribû û dest avêtibûnê. Li gundê wî, heta li temamê herêmê, gelek caran qûna pîrekan di feleqan de
belot kiribûn û bi »namûs»a wan lîstibûn. Ev hemû ji bo wî ne şerm bû. Ew ji malên wan derdixistin, dikuştin û termên wan diavêtin nav mayi-nan. Wawîkan termê kekê wî Cibran xwaribû û wî jî lê temaşe kiribû. Ew ji bo wî ne şerm bû. Dewleta wî a misilman wilo xwestibû. Jop radabûn hinavên wî û di devê wî de mîztibûn. Eskerên dewleta wî wilo emir kiribûn. Pîsî dabûnê û wî jî li pêş temamê gundiyan ew pîsî xwaribû. Rihê wî di bin nalên hespên emewî û ebasiyan de perçiqîbû û vê perçiqandinê tesîr l ser ne kiribû. Ketibû taya ku gelo wê başçawîş li pişt wî an li pişt dijminê wî bisekiniya. Ev ji bo wî girîng bû. Başçawîş Circîs rakiribû salonê, ev ji bo wî elameteke ne xêrê bû, gerek ew rêyî zindanê kiriba. Ji aş û baş digot û ditewirand:
»Gelo Circîs çiqas pere dane başçawîş? Çi jê re gotiye heta ku bûye
182

hevalê wî? Min li himber wî çi qisûr kir gelo? Min hinekî li jina wî nerî, nebe ku ji vê zivêr bûbe? Belkî jî ji ber ku ez di eynî rojê de ne hatime gilî, ji min zivêr bûye. Gerek min bi a wê qahpika jina xwe ne kiriba û ez di cih de bihatama vir. Ha, dibe ku Hemo ew zivêr kiribe; kûçik lawê kûçikan zimanê xwe daqurtandibû. Na lo, ew jî dizane ku Hemo ne tu gû ye. Wey erê bi Xwedê, min fêm kir bê çima başçawîş ji min zivêr bûye! Ez doh di hizûra Bîçer de ne maqûl peyivîbûm. Him ma ne wî jî gotibû ku me dilê Bîçer hiştiye. De na lo, Nisêbînê li ku û qereqola Stilîlê li ku; ma bû cin ku hema wilo zû ew gotin pê re gihand. Min di derekê de mi-heqeq çewtî kiriye, çi ye ew çewtî? Ji ber wê çewtiyê ye ku başçawîş, Circîs

nêzîkî xwe digire. Ez gunehkar im, gunehkar im!..«
»Heso axa!«
Heso veciniqî û serê xwe wek ê dîkan rakir. Ji kêfan re dikir bifiriya. Eger baskên wî hebûna ew ê miheqeq bifiriya.
»Kerem bike, begê min.«
»Berî ku tu bersiva min bidî, dev û ruyê xwe paqij bike.«
»Ser herdu çavên min« got û bi herdu destan çakêt bi ser serê xwe de bilind kir. Çakêt reş bû. Mêrdînkî hatibû dirûtin. Serpişt di pembo de nepixî bû û berstik jî bi qasî qûşa hespê pan bû.
»Îşev tu ê li zindanê mêvanê min bî, ez wilo dixwazim temam!«
Di ruyê wî de guhertin ne bû. Ew ruyê wî ê çaroxî, kêfa dilê wî ê reş di-da dest. Şevekê, du şevan, sê, çar, pênc şevan, mehekê, du mehan di zin-danê de maba wê çi biba. Başçawîş jê re gotibû »Axe, tu mêvanê min î.« Ew bes û heta zêde bû jî. Eger komutên ji serî de wilo jê re gotiba, ji dil û can û bi rojan wê qîma xwe bi wê qeşmeriya berî niha bianiya.
»Gotin a te ye, tu çawa rê lê bibînî, helbet wê wilo bibe begê min. Tu serê me yî û em jî lingên te ne, em bi mezinahiya te hene. Îcar begê min, eger min di hizûra te û xatûna xwe de qisûrek filan kiribe, min bibex-işîne.«
Heso ji Circîs jîrtir û zanatir bû. Gava difikirî û digot, dizanîbû bibêje. Eger hema hinekî bi insaniyeta xwe werqiliya, ew ê serê xwe di ilim de biêşanda, belkî bûba fîlozof û Circîs hedayet bikira. Bi aqil bû, îcar ji ber ku aqilê xwe hemû di xerabiyê de bi kar dianî, bûbû bêaqilê herî mezin.
»Fatîh Heso axa bibe zindanê.«
Zindan bi qasî oda başçawîş mezin dihat. Çarçikî bû. Firehî û dirêjaya wê tam pênc metro bûn. Di şûna pencerê de, bi tenê kulekeke caxkirî di dîwarê bakur de hebû. Kulek li erdê rûniştibû, ya jî li erdê dinerî.
183

Hindurê wê tarî û ewqasî jî sar bû. Mişkan di asasê dîwêr de seranser qul çêkiribûn. Di bin reşaya zindanê de devê qulan wek devê top û metralyozan vebûbûn û xof didan! Hindurê wê tije pîsî û cendekên mişkan bû. Bêhna pîsiyê, mişk û mar û miriyan di bin zikê zindanê de doran girtibû. Gava ba xurt dihat, bi lez bin zikê zindanê dialast, wek mijê xwe berdida jêr û di hindur de digeriya. Binê zindanê ne betonkirî bû. Ji ber wê bêhna zinix, mirov nikarîbû serî rakira. Nikar kewşikî bi ser axê dakiribûn. Havînên vê zindanê bi qasî xeta mayinên ku dilê welêt felqe felqe kiribûn, tehlûke dida. Dûpişk hebûn. Maran di kulekê re xwe berdidan hindur û mişk dixwarin. Di vê zindanê de ji sala 1926an û heta niha, sêzdeh gundî miribûn. Ji bilî sê kesan, bi ên din hemiyan jî mar vedabû. Başçawîş û komutanan gava qesda kuştina gundiyekî dikirin, ew havînan diavêtin vê zindanê û heta ku mar pê venedaba, dernedixistin. Gelek haweyên wan ên kuştinê hebûn. Bi darên hindurê newalê û hewşa qereqolê ve bi roj û şevan insan daliqandî hiştine heta ku can dane. Di sala 1932an de gava »Eskerê Lîwa« serê axê omeriyên mahmûtkî Eliyê Ehmed û malbata wî jê dikin, tînin vê qereqolê. Çewalê ku ji seriyan dagirtibûn, pênc seetan dixin devê kaniya Elî Mercê. Avê di xwînê de sor vedabû û çem dabû ber xwe.

Mezinahiya zindanê dibe ku bi we hinkî balkêş bê. Di pevçûnên gundan de, carina temamê gundiyan digirtin û garankî dixistin vir.

»Lawê min Hemo, li xwe hayî be, marin bi te venedin, ha!«

Heso di nîvê zindanê de rûniştibû. Heyecan ji ser çûbû. Lebatên wî hêdî hêdî bi xwe şiyar dibûn û di tayê de dixewirîn. Canê wî diêşiya, diricifî.

»Apo ez şipya me, tişt bi min nayê, ez ji te ditirsim. Ranezê, haş xwe bike.«

»Xwezî xewa min bihata lawo, lê wê çawa di nav hêsîriya vê kûçkaniyê

de bê! Na lo, hewcenake ku mirov xwe ewqasî bitirsîne. Zivistanan mar ji qulên xwe dernakevin.« Xwest ku bibêje, ma ji xwe mar di kulekê re tên û di vê qefaliyê de wê mar nikaribe bê«, ji nişkê ve veciniqî, lingê xwe ê birîndar bi hinc li erdê xist, »Kuro hat hat!»û tevxircilî.
Wî digot qey mar e, lê cerbohek bû, xwe li bêhna mûyê dohnkirî û gora hirî girtibû. Devê xwe avêtibû serê tiliyan. Bêhnekê wilo bêdeng sekinîn. Dûv re têgihan ku êrîşbaz ne mar e, mişk bûye.
»Hemo ma tu dibê, wê lawê qûnekê jî bînin vir? Gava min anîn vir, ew jî biribûn salonê.«
184

»Wilehî çi zanim, dibe ku wî bînin û dibe ku wî neyînin jî. Mirov tiştekî ji van bêbavan fêm nake. Geh dost in geh dijmin in, geh dikenin geh digirîn...«
»Ka bise bise! Ma tu dibê, wê çawîş destê wî bigire?«
»Bi qasî ku min ji rewşê fêm kiriye, çawîş xwe daye pişt wî.«
Bi zirt got:
»Bes e bes!« û ponijî.
Li gor wî Hemo ne tu dûnde bû. Karê vî mirovî her tim gotina dawî di pêşî de û a pêşî jî di dawî de digot. Lê Heso jî dizanîbû ku ev ne zilamekî hofkgerîn e. Çiqasî ponijî ewqasî ricifî, kete tayê û laş lê giran bû. Xwedî tecrûbe bû. Di cihê teng de mirov çawa dikarîbû bi nezanan bişêwiriya! Wens tiştek bû û şêwir tiştek bû. Ev hemû li aliyekî, tew îcar canê wî bi carekê ve diare, hindur wek qeşê sar e û ew ê jî biponije. Moral jê re lazim bû û bi hêsanî jî dikarîbû ew moral çêkira. Di civatê de henekçiyekî temam bû, herkesî bi heyran li devê wî dinerî. Bi rê de bûbû mitirb, devê wî ne diket hev. Li hindurê qereqolê bi textê Xwedê digirt û dihejand. Di cihekî wilo talûke de bêdengî mirin bû.

»Apo apo, çima deng ji te biliya?«
Apo deng ne kir. Ew bi bazdan hat ba wî û li ber çong berdan erdê.
»Apo ma tu pir diêşî?«
»Ha, te got çi?«
»Min got tu çawa yî? Ma tu dixwazî ez laşê te bifirkînim hi?«
Xwe veparimand û keser veda. Bêhna wî bi zorê derdiket.
»Na na, ez wek bivir im. Erê kuro, ne te dît bê wê qahpikê çi dikir. Ê hema bi telaq ew rojê tabûreke esker berdide ser xwe.«
Hemo ne ji dil keniya. Kenê wî ne xweş bû. Dengê zîxanan dida.
»Miheqeq.«
»Na na, miheqeq çi ye îcar! Bi şêxê erdê li Bexdayê, tam wilo ye. Ez ji pîrekê fêm dikim. Erê, ne te ne dît, bi dû te de hertiştê xwe berda meydanê! Ew bû lo, hindik mabû ku bibêje, de werin. Tobe estexfîrulah, ya rebî me dîsa devê xwe herimand.«
Hemo rabû ser xwe û li dor xwe nerî. Mîza wî dihat. Li hindur piçûk, mezin destav qedexe bû. Lê çûna qedemgehê jî qedexe bû. Ji bo vê yekê derî vedikirin.
»Min dixwest ez avekê birjînim. Ma ez li derî xim, tu çi dibêjî?«
»Bêfêde ye lê ka dîsa te divê xwe biceribîne.«
Hemo tibabekî li derî xist. Fatîh hat. Zeraqa deriyê hesinî vekir û bi

hêrs got:
»Çi ye, qûnek?«
»Min bibe qedemgehê.«
»Serê xwe bi vir de bîne pûşt!«
Wî serê xwe ber bi zeraqê de bir. Fatîh pêşî tif kirê, dûv re şiqamek di

nav çavên wî de şelpand, bi hinc zeraqe girt û çû.
»Aha te ev divîbû ne wilo. Hizra te ji qebheta te mezintir bû.«
»Îcar ez ê çawa bikim?«
»Çawa tu ê çawa bikî, her derê vê zindanê qedemgeh e, bike bila here. Bersiva lawê qahpikê yanî dibêje te, bi xwe de berde, tu çima fêm nakî, weh!«
Hemo di qorziya aliyê başûr de bi ser qula mişk de berda. Sê, çar mişk bi hev re ji qulê bazdan û xwe li nav lingê wi qelibandin. Hemo bêserî, çep û rast û paş û pêş bilindbû û li wê navê çû û hat.
»Te bi ser lawên ca
mêran de kir, ne wilo? Ma lawo te nizanîbû ku vir dergahê wan e, tu bi ser dergah de bimîze, wê ew jî li xwe biqewimînin. De xwe tam biher-imîne«, dikeniya û digot.
Bi rastî ev zilam ji weqehetan pê ve bi kêrî tiştekî ne dihat. Qulên mişkan xuya dikirin, li qulan dinerî û li xwe hayî ne dibû ku bi ku de berdide.
»Erê, ew te çima li ba yarê gonê digot 'Ben bilmez emce bilir hi?' Kuro ma min wilo ji te re gotibû allahummessabirîn! Tu dizanî bê ev a te, bû wek a kê? Bû wek a Gepoyê Qadê. Mêrik gava li civatê rûdinişt wek ku kevirek rûne bêhis û pis disekinî. Yanî tiro xwe giran û kemlan dikir, hi. Wî digot qey gava mirov ne kene û ne peyive camêrî ye. Min ew hînî ken kir. Lê xwezîka min ne kiriba, diziriya kuro! Me ew hînî ken kir, lê me ne got bizire bavê mino! Îcar a ku te îro kir, eynî bû wek a wî zir kerî...«
Herdu jî dikeniyan. Hemo ji dil, Heso ne ji dil dikeniya.
»Apo, ê hema bi Xwedê ez ji desthilanîn ne ketibûm, lo.«
»Ehmeq ku dibêje ez ji desthilanîn ne ketibûm, wilehilezîm ji tirsan qûn li te qetiyabû. Devê te ketibo hev, bavikê mino. Te hertişt berme-qlûb fêm dikir. Te tam wek Ehmed kir, ma bi tirtirê ye, qey. Ehmed jî li

mehkemê mîna te kiribû. Golikê ji dizan dikire û gava xwedî derdikeve jî lê asê dibe, bê çi xweş e. Îcar gava ku hakim pê re dipeyive, devê wî wek ê te dikeve hev û ji hertiştî re 'inek ogli' dibêje. De were û nekene. Tiro him nizane ku bi tirkî navê golikê çi ye û him jî xelkê radike mehkemê. 186

Lo hema ez çavê wî bixwim, eferim jê re, mehkeme tije 'inek ogli inek' kir û dev jê berda.«
Xwe aciz kir, destê xwe hejand û bi hêrs dîsa got:
»Erê, te çima ji yarê diya me re tiştekî wilo wek a Ehmed ne got! Hema te jî bigota ben bîlmez bergîl bilir. Ma ne qaşo em bi bergîlê hatibûn qereqolê. Çima te hertişt diqulipand situyê min, hi? Hakim jî mîna başçawîş ji Ehmed re gotibû 'navê te çi ye' û wî jî di bersiva wî de 'inek ogli' gotibû. Erê Xwdê ji te razî be, te çima ne got, navê min bergil ogli ye ku Circîs li te siwar bihata. Tobe ya rebî estexfîrulah!..«
Hemo wek pûtekî sekinîb
û. Li ber xwe diket. Ji xwe kezeba wî kul bûbû û Heso jî ha ha xwê bi ser kezaba kulkirî dadikir. Berî hertiştî vir ne cihê hesabsitendinê bû. Carina tam wextê gotinêye, lê cih ne cihê wê ye û carina jî cihê gotinê ye lê wext ne wextê wê ye. Vî zilamî digel wêqas berberiya ku kiribû hîn jî nizanîbû serê van herdu benan pev girêda. Piştî gotinê bi xwe dihisiya ku ne baş kiriye. Qenc xerab tiştekî xwe pê re ne digirt. Dewlemend gava miriyekî dibînin bi xwe dihesin ku mirin heye û ew ê jî rojekê bimirin. Îcar di wê bêhnikê de istixfarê bi Xwedê tînin û çend xêratan dikin. Heso jî gava gotina ku ne a gotinê ba û digot, dûv re bi xwe dihisiya û istixfar dianî. Wek dîkê ku hêkan vexwe, gotin li ser gotinê diherikand. Dilê wî li hûrê wî çûbû. Du, sê seetan gotinê xwe pê re ne digirt. Li ser vê yekê ew

û Sarê gelek caran ketibûn qirika hev. Sarê jina wî bû, helbet wê xwe jê re
tazî bikira, xwe bi dest ve berda û heta serê wî jî bişûşta. Di nav livînan de çi bikira bi ro li civatê digot. Li gundê wî û heta li temamê herêmê herkesî dizanîbû ku sê şanên niçikî di zikê Sarê de hene. Hûto wek mirovekî devvekirî didît û henekê xwe pê dikir. Lê di rastiya xwe de Hûtoyê mezin ew bi xwe bû. Ji aliyekî de ewqasî dilvekirî û ji aliyekî de jî ewqasî zikreş bû. Du tiştên ku hîç wê nikaribana li hev bikira tê de gihabûn hev. Derewê bi xwe rih piçûk dikir û rê li teşqelê, teşqelê rê li diziyê, diziyê rê li bêbextiyê, bêbextiyê jî rê li temamê xerabiyan vedikir. Mirovekî gava derewîn ba, bi rehetî dikarîbû bûba maka xerabiyê...
Seet li dor çaran bû. Gavên berê dewaran dabû gund. Ji weşa garanê xuya dikir ku di nav vê garanê de ne hesp û ne jî bergîl hebûn. Gavên garan ragirtibû û ji kêş dewaran bêçêre xwe berdidan. Dengê reqe reqa kevirên ku ji ber lingên wan dipekiyan, di hêtên zindanê de disekinî. Çêlek dioriyan. Ba xurt dihat, xwişînî bi daran ketibû. Ew çûkê ku çend seet berê li ber derî, beton ditiktikand qet ne hat ber vê kulekê. Dengê

zarokan ji xwe hîç ne dihat. Mêşek, heta pêşiyek bê çibû, li vê zindana ku di pîsiya zilmê de hatibû seyandin, tune bû. Mar û dûpişk hebûn. Lê li dojehê jî eynî ev mexlûq hebûn. Dojeh di bin heft tebaqên erdê de bû û bihuşta ku navê wê »Cenetil mawa« bû, di xwezaya erş û ezmên de sekinîbû. Li dojehê maran jar û hejar dixwarin û li bihuştê jî amirhêzan di mêrga horiyan, yanî dîlberan de borana şehwetê radikirin. Heso jî istixfar dianî û selewat didan. Bîr ne dibir ku li dojehê limêj, selewat û tekbîr

û xêr û xêrat wê derbas nebin. Ew di dojehê de ye, bihuşt jî hema li ser wî
ye û dîsa jî nabîne. Bihuşt bi dengê hoqeboq û kêf û seyrana dîlberê di-hejiya. Û Heso jî zorî dabû tekbîr û selewatan. Li mala xwe tu carî ewqasî xwedayî ne bûbû. Li vê herêmê ji wî bêtir kesek bi islamê û xwedayê wê danediket. Û li vir jî dibû misilmanê herî mezin.
»Apo çima dîsa deng ji te nayê?«
»Ez limêja ku îro li min çûbû qeza dikim.«
»Xwedê qebûl bike.«
»Amîn.«
Di vê bêhnikê de çiqasî dixwest ku çayidanekî çayê vexwara û bi ser de tam qutiyeke tûtina Xursê bikişanda. Ji malê bi hesabê ku wê di zindanê de çixare bikişanda, kîsikek tûtin û çend defter pel anîbûn. Dizanîbû ku li zindanê çixarekişandin qedexe ye, lê wî digot ez ê bi pereyan vê yekê safî
bikim. Wek wî ne bûbû. Di eslê xwe de ku ev, ew ê gund ba, dikarîbû gelek tişt safî kiribana. Heyvanê mêranî û jîr û zanatiya ê gund li dor ne-ma bû. Wî bi xwe di civatê de her roj digot ku bêpevçûn ne tarîx meşiyaye û ne jî tu kesî tiştekî herî basît safî kiriye, heta ku em dev ji berberiyê berdin û nav xwe û Circîs safî bikin. Dîsa wî digot, »Jin bi exlaqê xwe ê xweş dibe xatûn û mêr jî bi mêrxasî û ciwamêriya xwe dibe axe.« Lê mix-abin li vê derê jî bûbû pûş û pelax, di nav qirêj û gemara binê zemên de dişewitî û bi avdohnka wî laşê xwe ê genî, rûpelê tarîxa xwe dilewitand. Şingînî bi deriyê zindanê ket. Mirovek kişiya hindur. Circîs bû ev.
Çawa ku hat, bêmefer kîsikekî cawînî ji bêrîka xwe derxist, li ber dîwêr xwe daqûl kir û kîsik da ber qûna xwe. Bîstikekê di vî halî de ma. Piştî ku bi devê kîsik xwe paqij kir, kîsik li hev pêça û ber bi kulekê de meşiya. Cebila ku kiribû di kulekê de danî û ji dijminên xwe dûr, pala xwe da

dîwêr.
Cebila ku kiribû, bêhneke pir genî berda hindurê zindanê. Bayê ku distendin hemû di vê kulekê re dihat. Heso xwe zêde zêde zivêr kir!
»Bêşeref, ma em mirîşk in ku em guyê te bêhn bikin hi! Zû here wî gûyî
188

ji wir rake!«
Circîs ber pê de meşiya û got:
»Bêşeref lawê bêşerefan tu yî!..«
Hemo fikirî û da ber hev. Li gor adetên eşîrî, li mirovekî wek Circîs yextiyar xista, şerm bû. Îcar di cihekî wilo teng de ji xwe hîç çênedibû. Pir şerm dibû! Xwe mecbûr dît ku têkeve navbera wan. Heso nexweş û rûniştîbû û siqêf pê re dikirin. Ê din jî wek keftarekî li ser xwe bû û wî jî habela siqêf pê re dikirin. Rû bi rû bûn. Lê di bin reşaya zindanê de ruyê hev ne ditefsilandin. Eger di şûna vê reşayê de ronahî ba, belkî ji hev fedî kiribana û ew gotinên kotî bi hev re ne kiribana. Helbet Hemo wê ew zeft bikira, êrîşî ser Heso dikir.
»Kûçik lawê kûçik min zeft neke!..« û şiqamek avêt Hemo.
Dîsa li gor adetên wan ên eşîrî, Circîs jî gerek siqêf bi bavê Hemo re ne kiribana. Bavê wî miribû. Ew kesê mirî çendî dijmin bûba bila bûba, kesî nikarîbû siqêf pê re bikirana. Pir şerm bû! Cezê wê kuştin bû.
Hemo:
»Ji bavê min re xeberan nede!« got û dahf dayê.
Bi dahfa wî re serê Circîs li dîwêr ket, serî piçekî zelhitî. Xwînê cihê zelhitî hema hema şil kiribû.
»Esker, begê min! Esker, esker min dikujin haho haho!..«
Fatîh û Yavuz zû bi wan ve gihan. Ji xwe dizanîbûn ku wê tiştek biqewimiya. Li ser mêrdewanên jor rûniştibûn û li wan guhdarî dikirin.

Bi lez û bez hatin û zeraqe vekirin. Circîs li ber zeraqê bû. Bi vekirina zeraqê re peyivî:
»Begên min, van herdu eşqiyan li min xistin û serê min şikenandin. Eger hûn min ji vir dernexînin wê min bikujin. Ez di bextê we de min zû ji nav lepên van cenewaran derxînin...«
Eskeran derî vekirin. Derî bi zor vedibû. Ji zîqîniya zîlanê xuya dikir ku derî bi qasî temenê qereqolê kevin bû. Fatîh bi çepilê Circîs girt û di nav xwe re hilkişandin jor. Hemo jî ji qorziya zindanê li wan dinerî. Di vê navê re jî du cerbohan mîna ku li ser xwarina kurkê Heso nakokiyek ketibe nav wan, bi şîqe şîq di hev re difiriyan. Bêhnçikyayî yek dihat vî alî û ê din diçû wî alî, li hindama Heso xwe çeng dikirin hev, bilind dibûn û dergûşkî li erdê diketin. Ji ber lingên wan zixurên nikarê mîna saçmeyên çiftan kulmikî dipekiyan û xurt bi hêtên zindanê ve dihatin xwar. Heso hema hilmekê be jî, bi pevçûna van cerbohan Circîs ji bîra kiribû û rihê wî ê perîşan azat jiya bû.
189
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Lawê min Hemo, ez baş tê ne giham ku wî teresî ji wan teresan re çi got. De hema hewce nake tu ji min re bibêjî, insanê ku şipya bi xwe de berde, ma tu ê hêviya çi jê bikî. Ha lawo Hemo, li xwe hayî be, dikarin te bibin. Ma tu ê çawa li xwe hayî be. Ez jî bi rastî carina wek zarokan dipeyivim. Em di destê wan de ne, em malên wan in, em ji bo wan hene, em kolên wan in, em xulamên jinên wan in, em mehkûm û xwîniyê Circîs in! Ê ne Circîs, ê ne Circîsko ne bi xêr eger ez ji vir derketim, bila Xwedê ji min û te re kerîm be û hew!«
Panzdeh, bîst deqîqe ne ketin wê navê, dîsa deng bi derî ket. Heso veciniqî. Hemo di cihê xwe de sar bû û xwe bi ser hev de guvaşt.

»Lawê qahpikê Hemo were!«
Heso devê xwe tije kir ku bibêje, »Min jî pê re bibin û asaqên ku hûn ê di wî de bikin di min de jî bikin!« Lê başçawîş hat bîrê, gotin daqurtand. Tiştekî din got:
»Lawo Hemo mêr be, xwe li ber lêdanê bigire, ay ûy nebêje da ew bê-namûs bi te nekene« û di cihê xwe de wek hêlanê hejiya.
Eger bi Hemo re derketa û sênga xwe ji lêdanê re vekiriba, başçawîş wê bi vê yeka ha paş de gav biavêta û xwe nedaba pişt Circîs. Ji ber ku wî a ku xwestibû kiribû û dor zîvirîbû ser sitendina pereyan. Wî bi xwe digot, »Herçi komutanên hidûd, başçawîş û eskerên wan hevalên pereyan in.« Û pir jî pere pê re hebûn. Digel wêqas xesîsiya xwe jî ji Circîs çavfirehtir bû. Li qereqolê başçawîş her gav ew anîbûn ba hev û bi haweyê ku li hev zêde bikin pere ji wan sitendibû. Di vê li hevzêdekirinê de Heso jî her tim li Circîs zêde kiribû. Bi qeweta pereyan dikarîbû li xwe biqewimanda û bi Hemo re derketa meydana êşkencê. Ji bo ku lêdan hinekî ji ser Hemo kêm bikira, dikarîbû ji eskeran re bigota Circîs hûn anîne lîstika xwe û ew derewîn derxista. Di tûrikê wî de gelek bersiv hebûn û bersivekê jî nade. Başçawîş ne gazî wî, gazî Hemo kiribû ku êşkencê lê bike. Di vî warî de rabestineke wî a piçûk, dikarîbû bûba sebebê ku başçawîş li ba Circîs sef bigirta. Wilo difikirî.
Fatîh û Yavuz, Hemo bi dû xwe de kişkişandin û avêtin hindurê zin-danê. Li dor nîv seetê lê xistibûn. Bi zor xwe li ser lingan digirt. Ditewtihî, xwe bi dîwêr digirt û dimeşiya. Xwîn ji devê wî dihat. Kulm li çenê xistibûn argûşkên wî diariyan. Dilê mirov bi halê wî dişewitî. Pêşî di hin-durê salonê de baş lê siwar tên, dûv re meydangirî ketûber wî didin ber hev û dûv re jî wî dixin felaqê. Digel ku bi daran binê lingên wî teqandibûn, dîsa jî kirpînî ne ketibûyê. Ev ne ji ber mêraniyekê û filan û
190

bêvan bû, Circîs li himber wî sekinandibûn ji ber hindê. Felaqe zor bû. Lê ne bi qasî xwepiçûkkirina li himber Circîs zor bû. Bi dû lêdana çend daran de, binê lingan wek pelê sîrê tenik dibûn û kezeb dikişiya. Gava ku ling di xwînê de dixiliyan û hîn jî lê dixistin, te digot qey ling û kezebê cih bi hev guhertibûn êşek dijwar dida! Bikira hewar hewar belkî ewqas lêdan
ne xwariba. Belkî jî hîn bêtir bixwara, çimkî ên ku lê dixistin, mirovin çavsor bûn. Ev çavsor bi dengê qîr û hewarên wî dikarîbûn serxweş bûbana û ew jî wek Qadirê talatî bi êşkencên ecêbnedîtî bikuştana. Gava naziyan bi yek tûşê re deh hezar deh hezar cihû diavêtin firinan, qey wan insanan ne kiribûn hewar hewar! Zarok ne giriyabûn! Îcar yextiyar ne di-naliyan! Çavên dayikan xwîn ne dibarand! Jinên ducan hîç ne zûriyabûn, ha!..
»Hemo tu pir êşandin, ne wilo?«
»Berberî ye ev apo, divê em qîma xwe pê bînin.«
»Rast e divê mirov mêrxas be. Li himberî dijminê xwe bi qasî pola qewîn û ewqasî jî zalim be. Çîçika dijmin bê çi ye, gerek mirov sax bernede. Bi sîlehê herî mezin gerek mirov Circîs û zarokên wî bikuje. Gerek kinêsa vî zilamî bi carekê ve bitefe!..«
Ji kîn û nefretê hinavên wî di ser hev re diqulipîn. Kefa destê xwe ê rastê tije nikar kiribû û diherifand. Rîha wî di bin reşaya zindanê de qîr ved-abû. Cerboh ketibûn bin kurk, kurk dikelpitandin û wî jî serê Circîs dikevajd.
»Ma tu çi dibêjî, em hinekan ji wan bikujin? Ha tewra, eskeran digot ku doh Bedran jî li vir bû.«
»Na lo, ew jî li vir bû ha!«
Bêhnekê ponijî û ji nişkê ve got:

»Rast e rast, derengî şevê bû kûçik li tara jêr direyan. Doguj bi haweyê ku wan bidire diajot ser. Ez bi xuşûş ketibûm ku hin ji wan ji Sitilîlê di-hatin. Doguj bi derewan ne direya. Zeriya jina min yanî xweha Circîsko dîsa ez xapandim û me ew reyandin ne kir tiştek. Ha, te got em hinekan ji wan bikujin?«
»Erê.«
»Ne bi tenê hinekan, hemiyan hemiyan! Û ez ê derkevim mehkemê, hertiştî têxim situyê xwe. ku ne wilo be, em ê tu carî ji wan kûçikbavan xelas nebin. Lawê kûçik hindur tije Circîs kirine, yekî ku bi kêrî ometa Mihemed bê di wan de tune ye. Ha, lingên xwe germ bigire ku zêde ne werimin û jan nede. Bimeşe, sekin pîs e. Ma wekî din çi ji te kirin?«
191
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Ew ditirsiya ku jop xistibin destava wî.
»Pêşî çend kulm û şiqam û pehîn û dûv re jî felaqe.«
»Yanî bi tenê ev, tiştekî din ne bû, ha?«
»Na, bi tenê ev asaq di min de kirin.«
»Xem nake lawo xem nake, em ê vê tirê jê re nehêlin...«
Dê hîn gelekî bigota, lêbelê ji nişkê ve qêriya:
»Eeehew kuro mêrikan min dixwin, were bi min ve!« û kurk firand ber dîwêr.
Hemo bi lez hat pê ve.
»Ka li ku ne?« got û li dor zîvirî.
Heso keniya:
»Kuro lawo çi li ku ne, mişk bûn reviyan û çûn, weh!..«
Hemo rahişt kurk, Heso pê re xeyidî:
»Bihêle bihêle! Bi telaq eger îşev ew kurk li ser min be, çi mexlûqên ku

di vê zindanê de hene, wê ji qulên xwe derkevin û bi tifaq êrîşî ser min bikin. Howeh li vê ecêbê, heta bi teban jî bûne dijminê min! Îcar lawo ewêtullah, bihêle bila ji wan re be. Ew jî zekata qu... jina Circîs. Bihêle!..«
Ji xwe gerek ji pêşî de ew kiriba, kurk biavêta ji cerbohan re ku canê xwe ji dest wan xelas kiriba. Cerbohên vir gornebaş bûn. Û ev herdu jî birîn-dar bûn. Ji Hemo bêhna xwînê û ji lingê Heso jî bêhna mirinê difûriya. Bêhnê cerboh har kiribûn. Eger ne wilo ba, cerboh mîna mirîşkan ewqasî bêrû ne dibûn.
Heso vê carê jî herdu destên xwe bilind kirin, li bin zikê zindanê nerî û nerî û bû tîqtîqa kenê wî.
»Xwedê xêr bike apo, ka bibêje miheqeq xweş e.«
»Erê niha tu bi qedirê Melekê Tawis kî, ew çibû a ku îro me kir!«
Hemo guh bel kirin:
»Kîjana ku me kir?«
»Erê ew çi aqil bû!«
Vê carê jî mîna ku wî bêisûliyek kiribe ji xwe tirsiya, guhê belkirî hîn bêtir bel kirin û situyê xwe ber pê de dirêj kir:
»Çima qey dîsa min tiştekî ne li rê kiriye?«
»Erê, hela me ew kund kuşt lo, îcar çima me ew çirand û ji pirtik kir!
Ka qaşo wê oxira me hilata, kulîmekên me wê di doşekê de bisinciriyana û sitû bi ser zemberîşan de bixiliya. Ka qaşo wê çawîş di dest me de bûba hevîr. Aqilê me li ê pîrekê çûye. Me ê îmana xwe bi kuştina teyrikekî kamil bikira, hi! De di nav îmana mişk û mar û dûpişkan de bigevize! Te
192

ew reben çirandibû, birako. Ma wê çima ne çiranda yabo, ji bo ku tam oxira wî hilata divabû ew çilvirî bikira...«
Heso lê germ bûbû û zebaniyan jî li wan guhdar dikirin.

»Erê kuro, lawo ewqasî jî bêbavî nabe, ha! Lawê tirê, doza qaçaxçiyan li min dikir. Eger gava ew bixwazin, di bîst û çar seetan de dikarin qaçaxçiyên vê dinyayê hemî bigirin. Qaçaxçiyên mezin ew bi xwe ne. Qaçaxçî bi wan qaçaxê dikin. Qaşo eskerên wan bi şev û ro di tabiyan de ne û nobetê li hidûd digirin. Di destê wan de sîlehên herî mezin hene. Ji bilî vê jî cêbên wan, doc, panzêr û helîkopterên wan hene. Û di destê mêrê qaçaxçî de jî, ya çiftek ya jî tivingek heye. Qomandar û general bi rêya qaçaxçiyan tev bûn lord...«
»Heso Kaplan, komutan te dixwaze meqamê xwe!«
Heso di bin germa rivîna gotinan de bêî ku Circîs bê bîra wî, bi hinc destê xwe li erdê xist û got:
»Dixwaze dixwaze yanî çi! Ez têm! Temam! Heydê!«
Bi qahr rabû ser xwe. Lingê tehenî pê re hilnanî, kumişî û li ser çar-lepikan ber bi derî de herikî. Hemo xwest ku têkeve ber pala wî, lê ne hişt. Fikir dikir ku dora êşkencê hatiye wî û gava Hemo pê re derketa jorê, dê careke din êşkence bidîta. Bi ser de rabû:
»Tu li cihê xwe rûne û mitala min neke!..«
Esker ketin çep û rastê wî û hêdî bi hêdî hilkişiyan. Heso heta ku negi-ha meqamê başçawîş jî, hîn tê ne gihabû ku wê êşkencê lê nekin. Circîs li cihê ku berî seet û nîvekê hev pîs kiribûn, li ser pêyan sekinîbû. Heso hinekî ji wî dûr ber bi şibakê de dan rûniştandin. Dûv re jî li ser emirê başçawîş Circîs rûnişt. Xanim çûbû qedemgehê, bêhna parfûmê ewqasî ji odê ne dihat.
»Heso axa, pêwîst nake ku ez mezbeta gilîkirinê ji we re binivîsînim û we rêyî mehkemê bikim. Li meydanê ne kuştî ne jî birîndar hene. Eger birîna lawê te giran ba, dibû ku min tiştek kiriba, lê tiştekî wilo cidî ne qewimiye. Îcar vê carê, ez we efû dikim û hema niha jî we dişînim gund. Ma gotineke ku tu bibêjî heye?«

Heso bêhnekê ponijî. Axavtina wî li hesabê wî ne hatibû. Ma ne ji xwe, di vir de Circîs qezenc kiribû. Him lawê wî birîndar kiribû, him berî wî hatibû qereqolê û him jî li qereqolê li wan xistibû. Gotinên başçawîş ji bo Circîs şîr û şekir û ji bo wî jehra silêmanî bû. Qebûl neke, wê komutan êşkencê lê bike û bi mezbeteke xerab wî bi ser hakiman de bişîne. Dikarîbû xwe li ber êşkencê bigirta, lê dîsa jî wê tiştek bi dest nexista. Ji

ber ku hakiman bi tenê li îfada ku başçawîş dinivîsand temaşe dikirin û biryar didan. Îcar a herî xerab, başçawîş wê çavreşî biavêtayê û heta ku li vê qereqolê ba jî li ba dijminê wî cih bigirta. Qebûl bike, di bin Circîs de dimîne û wê Circîs bêtir lê har bibe. Aliyek tahl, aliyek no ye. Ji no û tahl divabû yek bixwara. Wî a tahl hilbijart. Herdu destên xwe ber bi başçawîş de bilind kirin, lê bêî ku li xwe hayî bibe, destên wî ber bi Circîs de dirêj bûn, destan tam ew işaret kir û wî got:
»Qomandarê me û ê mentîqê tu yî, helbet em ê ji gotina te dernekevin, tu çawa bixwazî, bila wek te be...«
Başçawîş ji destên wî kuribî.
»Helbet ez çawa bixwazim wê wek min bibe, yanî tu dixwazî çi bibêjî!«
»Bibexişîne begê min, dibe ku min xweşik ne gotibe û te jî çewt fêm kiribe. Ez jî eynî wek te dibêjim. Temam temam, yanî tu çawa bixwazî, wê wilo bibe.«
Heso tam ji moral ketibû, di vê bêhnikê de ne dixwest bipeyive. Gava ku xanim ji qedemgehê hatibû, li wan nerîbû û beşişî bû, wî ji xwe hîç lê jî ne nerîbû. Heso fêm kir ku gihane dawiya meseleyê. Circîs pereyekî mezin daye başçawîş û ew qanih kiriye. Êdî divabû wî jî xeraca xwe bida û deqîqeyekê berî deqîqeyekê ji vir bireviya. Destê xwe dirêjî bêrîkê kir,

bi hemd du kaxetên pênc sed pênc sed kişandin.
»Begê min ev jî xelata te« got û li xanimê nerî ku xanim ji dest bigire. Porê xanim şil bû, şeh jî ne kiribû. Di rûhinarkê wê ê çepê de mîna ku hinekan ew gez kiribe, keweke niqir niqirî xuya dikir. Sênga wê sor û mor bûbû. Cilên wê dîsa ên berê bûn.
Başçawîş jî nema dixwest ku bi dû meseleyê bikeve. Circîs du hezar û Heso jî hezar wereqe dabûyê. Pereyekî gelek bû. Motorsîkletekî jawa bi sê, çar hezarî bû. Heqê motorekî bi yek tûşê re rakiribû. Di dorê de herbî û hebîsî hebûn û hev kuştibûn. Ji wan jî bi kêmanî wê heqê texsiyeke reno bistenda; piştî du rojên din wê ji Zorava sê, çar elok, du beran û çar berx wek diyarî jê re bihatana. Ji temamê herêmê gundî dihatin sersala wî
pîroz dikirin û elok û pez jê re dianîn. Wî jî bêî ku wan bibîne û xêrhatinê di wan bide, li salona qereqolê heta ku navê wan li ba xwe qeyd dikir, di temenê de dihiştin. Navê ên ku mal ne qulipandibûn pereyan, bi qelema sor lêdikir. Ew jî ji bo ku di cara din de bike pere û bîne.
Xanim mîna ku başçawîş ne li vir be, xatûnkî rabû ser xwe û tena tena meşiya. Tiliya xwe a dirêj û nîşanê lebitandin, meqeskî kir û bi hêdî dahişt pereyan. Heso jî mîna ku bi siltanan re mezin bûbe, xwe nepixand
194

û bi haweyekî kubar ew destê xwe ê qilêrî, dirêjî nav tiliyên wê ên zer û maşikî kir.
»Kerem bike xatûna min« û awir li memikan veda.
Xatûna wî jî bi haweyê dildaran laşê xwe ricifand, »Teşekkurler Hasocigim« got û heta ku li ser kursiyê rûnişt bi wî haweyî meşiya.
Heso çavên xwe ji ser danegerandin. Dil ketibû memikan. Di rewşeke

azad de, hema deqîqeyekê, li mêrga memikan temaşe bikira, ji sedî sed wê
pê xweş bihata. Ji şewlaqê devê wî girêz diherikî.
»Heso axa êdî tu serbest î, xwe bide ser hev û bi rê bikeve. Fatîh, Hemo ji zindanê derxîne û wî û Heso bişîne malê.«
Heso û Hemo wek du pîrên nod salî dan ber hev û ji qereqolê derketin. Ro ketibû zerikê, ji çiyê xuya ne dikir. Li jor ewr li hev diciviyan û bi ser Sitilîlê de diherikîn. Ewrekî reş mîna konekî xwe li ser gund vedabû û ji cihê xwe ne diqeliqî. Çûk lûsiyabûn, kûçikan ne direya, dewar ne di-horiyan, ji gasînan pêjina insên ne dihat. Sipîndarên ku ji dûr ve newal û çiya kiribûn yek, bi bê re direqisîn. Xuşîniya çem di reşaya newalê de li jêr dengê bilûrê dida û wilo diçû û diçû.
Hewşa qereqolê derbas kiribûn û gihabûn qorziya kolanê.
»De ka bisekine« Heso got û ji dûr ve li qereqolê nerî. Devê xwe vekir, ji kûraya kezebê keserek kişand û kezeb bi bayê azadiyê nepixand. Canê wî bi qasî ku derman fêdê lê neke li hev geriyabû. Di nav reşaya zindanê de bi qîmetê azadiyê baş dizanîbû, lê gava xwe azad didît îcar qîmetê azadiyê bi qasî qirşikekî jî li ba ne dima. Di tengayê de bi qasî ku Xwedê dihat bîra wî, di fireyê de ewqasî ne dihat bîrê. Di demên tengayê de ku xwe bêçare didît, bi qasî ku êrîşî Xwedê dikir, ewqasî jî medet jê dixwest. Çiqasî di xwest ku bi rastî Xwedê heba û li halê wî bipirsiya...
Qereqol di roavayî gund û di berpala çiyê de ava bûbû. Li hewşa qereqolê ji zixurên bestan kilskirî bi tîpên mezin hatibû nivîsîn ku tirkek himberî dinyayê ye! Tirk esker çêdibe! Tirk bahoz e! Dîsa ji zixurên ren-gareng boyaxkirî sûretê eskerekî bi tiving hebû. Sûret bi qasî dêwekî mezin dihat. Qezetore li serê tivingê xistibûn û ji serê qezetorê jî xwîn dinisilî. Di bin dara tuyê de ku ji vê darê re digotin »Dara Şenaqê«, heykelê Atatirk li ser pêyan çikandîbû. Heykel mezin û reş boyaxkirîbû.

Di bin reşaya ewran de wek xeyaletekê bi xof xuya dikir. Atatirk destê xwe ê çepê danîbû ser kêleka xwe û destê xwe ê rastê bilind kiribû. Tiliya xwe a girdikê û qilîqîçanê girtibû û bi sê tiliyên xwe ên vekirî mîna ku tiştek rave dikir, sekinîbû.

195

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Lawo tu dizanî bê ew bênamûsê Atatirk bi wan hersê mîxên tilêyên xwe ên vekirî, dibê çi?«

»Na.«

»Guhdar bike. Ew teres dibêje ku li vê qereqolê yek namûs, dudu şeref, sisê ûjdan tune ye. Min ev hersê tişt li vê qereqolê qedexe kirine.«

Wê hîn bigota û bibilanda, lê Hedo wek gule di ber wan re derket û rast xwe li qereqolê girt. Wî berê xwe da Hedo.

»Ha ha zeriyê! Xwedê xêr neke, bi ku de! Keçê xatûnê çawîş, qomandar, esker ha ha qaçtî, qoydî, çiqtî!..«

Hedo tibabê neh, deh metroyan ji wan dûr sekinî, bi haweyê xwe Heso bersivand û bi lez ket hewşê.

***

Berberiya xwe bi xwe zimanê mirov kin û ê dijmin jî dirêj dike; mirov piçûk û dijmin jî mezin dike; ew pê xurt mirov jî pê qels dibe. Wilo li Heso û Circîs hatibû.

Heso û Hemo şeva xwe li mala dostê xwe Şaqûlo derbas kirin. Bi danê sibehê re Heso bi terempêla Qurmo ku rojê carekê diçû Nisêbînê û Hemo jî bi bergîlê, hatin malê. Circîs jî peya dabû ser rê û berî herduyan gihabû gund. Rêya terempêlê di navbera Sirêçkê û Zorava re dirêjî ser rêya Îpekê dibû û şifêr jî Heso li hindama gund di duryana rê de peya kiribû. Besta gund bêpir bû û çem jî diherikî. Terempêl nikarîbû

dageriya gund. Navbera cihê Heso û gund pênc sed metroyek hebû. Hewa niha wek a ku doh ji malê bi rê ketibûn. Hinekî sura bê zêde bû ewqas.
»Ya rebî de ka îcar safî bike, ez ê bi vî halî çawa xwe bigihînim gund! Ji bo hin bên bi min ve, ez bang bikim wê hûrî qeşmeriyên xwe bi min bikin, ez bang ne kim û li ser çarlepikan herim, wî çaxî jî ez ê bibim qirdikên wan. Ez bang bikim nabe ez bang nekim dîsa nabe, baş e ez çi bikim, hi?«
Li dor xwe nerî ku cihekî bi talde bibîne û lê rûne. Çep û rastê rê bi nihîtên mezin rapêçayîbûn. Pala xwe da nihîtekî, berê xwe da gund û bêhnekê li ser lingan sekinî. Dûv re kurkê xwe ê ku cerhoban bi carekê ve wek seradê qulqulkî kiribûn, li xwe pêça û rûnişt. Erd avî bû, bin wî şil bû. »Wey Xwedê ji min ne razî be!« çeng bû û bêhna xwe teng kir. Çend kevirên yeklepî ji derdora xwe dan hev, di bin xwe de rast kirin, li ser wan
196

rûnişt û vê carê jî bi xwe keniya:
»Min mejiyê xwe xwariye, bi telaq terî ji min kêm e. Ma ne ji xwe, çaraliyê min tije kevir in û ez jî di nav heriyê de rûdinim. Piştî ku heta bi mûyên qûna min şil dibin, ez ji nuh ve bi xwe dihisim û li keviran hayî dibim.
Min dizanîbû wê wilo bûba, gerek ez berî Circîsko biçûma qereqolê. Min bi a jina xwe kir, wey xwelî li serê min be ku ez jî zilam im. Ma mirov bi a pîrekê dike! Circîs bi wê qamka xwe em hemû xapandin. Yanî niha min çi ji vê çûna xwe a qereqolê fêm kir ez nizanim! Circîs him demaçê berda me em birîn kirin, him çawîş kire hevalê xwe li wir jî li me xist û him jî ji me ne hat ku em giliyekî bikin. Na na, ez ê nikaribim vê bênamûsiyê daqurtînim. Wî ne derbek, du, sê derb pev re li me xistin. Ez

nikarim vê tirê jê re bihêlim...«
Heso ji dûr ve bi nihît re bûbû yek. Gava xwe dilebitand ji gund dixuya ku mirovek di talda nihît de rûniştiye. Eger li ser nihît rûnişta, wê ji gund ferq bûba û heta belkî ên wek Zibêr û Miho ew nas jî kiribana. Sarê ji doh êvarî de çavrêyî lê kiribû. Car caran derketibû ser xênî û ji hêla çiyê de li Sitilîlê nerîbû. Sitilîlê diket bakurê gund. Di gava ku Heso li duryanê peya bûbû, ew sê caran hilkişiya bû ser xênî. Eger hema serê xwe piçekî ber bi roava de vekiriba, wê Heso bidîta.
»Wey bi Xwedê ew dengê Sarê ye, dîsa êrîşî ser kê dike gelo? Ez bawer nakim ku tu esker filan hatibin gund. Ma bû çi, hema her roj bigirin ser gund! Em ne Eliyê Betê û ne jî Eliyê Ehmed in ku em mala xwe û wan li topekê xînin. Ha dibe ku qançorçî bin, dîsa pere pir xwestibin û Sarê bi wan de pijiqî be. Qançorçiyên çi kuro! Çar, pênc sal in ku dewra wan rabûye. Ha temam, ev qolçî ne. Qey dîsa wek wê salê Xelefê me yê kasûlî, qutî dirêjî destê wan kiriye û xwe bi girtin daye. Û Sarê jî li xwe qewimandî ye. Bi rastî min aqilê xwe xwariye, qolçiyên çi! Qolçitî ji zû de zû de rabûye, bavoo. Ê erê naxwe ev jinik, bi kê re pevdiçine?..«
Serê xwe rakira û li gund bineriya, hewce ne dikir ku dîsa peya bida nav sitiriyan. Circîs best û best ji Stilîlê dihat û gihabû ber gund, Sarê jî xwe ji gund berdabû pêşiya wî û gotin pê re dikirin. Piştî ku gundî derdikevin ferca Sarê û Circîs û koma pîrekan li ba darên tuyan dicivin, Heso nuh di meseleyê de digihê.
»Eferim Sarê, lêlê pîrê tivingê berdêyê! Wî bikuje bikuje!..« Kurkê xwe li ba dikir û diqêriya.
Pevçûn bi kêrî wî hatibû. Gundiyan ew dît û bi xar pê ve çûn. Temo û

Miho berî Zibêr û Xelef gihan ba. Zibêr ji hemiyan bi aqiltir derketibû. Wî ker bi xwe re biribû.
»Ehmeq, hey te ker anîbû, îcar te çima kurtan lê ne kiriye. Ez ê çawa li vê kera tazî siwarêm, hi!«
Zibêr:
»Ji şelûpela ku li gund rabû, min xwe ji bîr kir...«
Heso xwe zivêr kir, bêî ku bizanibe çi dike, bi hêrs gopal di zikê kerê rakir, ker tengijî û çep û rast da lotikan. Qêrînî bi Temo ket, bi sênga xwe girt û di cih de rûnişt. Kerê lotikek li ser çiçika wî a rastê xistibû. Baş bû ku ker bênal bû. Zibêr hişk bi benê ku di situyê wê re derbas kiribû girt, pê re xeyidî ker sekinî.
»Zibêr, ma ker şemûs e?«
»Wilehilezîm min rojekê ne dîtiye ku vê kerê bi vê ecêba niha, wilo lotik avêtine!«
»Yanî tu dibêjî ez siwarêm?«
Miho:
»Erê apo erê, siwarê tişt nabe...«
Ker, hûrik û şînbozî bû. Hîç ne li gor Heso bû. Heso li kera tazî siwar kirin. Lê bîr ne birin ku kurkê wî têxin bin; di kurk de pêçan. Zibêr bi serê kerê girt, Xelef xwe da pişt kerê, Temo û Miho di kêlekan de dan ber hev û ziqitandin kerê. Lingên Heso hema hema ji erdê bilind bûbûn. Ji dûr ve dişibiya derwêşên ku bêerbane li genim digeriyan. Ji nêzîk de jî dişibiya bûka baranê. Lê ji ber ku xêliyan li tenekê ne dixistin, îcar dibû wek potikê nav bîstên.
Zibêr bi haweyekî cidî:
»Ma çawa çû apo?«
Ne wextê pirseke wilo bû. Divabû bigiha malê bêhna xwe berda, bixwara, vexwara, bi Sarê re rûnişta û dûv re ev dabaş vebûya. Di vê bêh-

nikê de Sarê difikirî. Bêriya wê kiribû...
»Wek quzelqurtê çû!« ew bersivand û lingên xwe li kerê hejandin.
Zû gihan besta gund. Çem bi hêdî diherikî. Heso cesaret ne kir ku bi kerê li çem xîne.
»Temo rahije min û min ji çem derbas bike...«
Temo ew li pişta xwe kir. Di nîvê çem de sekinî. Guhikê çefiya Heso gihabû avê. Zibêr tev li şekalê bi lez da nav çem, guhikê çefiyê hilda û guvaşt. Destekî xwe da pişta Heso jê re kire senede û bi destê din jî bi zendê Temo girt. Ji ber ku ev çem seraqet ne diherikî kevir ne şahîk û ne jî kefz
198

girtibûn. Bêî ku bişemitin bi rehetî çem derbas kirin. Pizûriyan mîna ku bûk dihat gund piçûk- mezin herkes ji malên xwe derketibûn û li wan temaşe dikirin. Sarê haziriya Heso dikir; jê re goştê kavirê ku du roj berê ser jê kiribûn dibiraşt. Şîva wan a îro serûpê, hûr û rovî bûn. Şîv li gor dilê Heso bû. Eger Sarê bizanîbûya ku wê Heso bi sibehkî re bihata, ew ê şîv bi sihorê re li êgir kiriba.
Heso wek generalê ku di şer de winda kiribe, di nav koma pizûriyan re bêî ku xêrhatinan bibersivîne, serê xwe berda ber xwe û derbas bû.
»Temo bizixitîne kerê!«
Temo bi a xwe kir, ne zixitandê. Gerek Heso li devê deriyê hewşê paya bûba, peya ne bû. Ji kerê daneket heta ku ne çû ber dika odê.
»Kuro pîro, ji wê kerê dakeve, ma qey tu ê wê biajo odê, weh! Bê çi pê nakeve, ew zir qelafetê ha û ev kerka hûrik. Hema te xwe hinekî ragirta, sê, çar bergîl di gund de hebûn me ê yek bi te ve bgihanda...« Sarê li bin beragirkê li ser lingan sekinîbû, pê dikeniya û diaxivî.
Heso bêî ku ji kerê dakeve û tiştekî jê re bibêje, wek ku gur li mîhê binere bêhnekê lê nerî û bi hêrs destê xwe bilind kir:

»Temo zû min biavêje odê!«
Ker cefilî, hindik mabû bikeve, Temo ew zeft kir:
»Xwedê ji te razî be yabo, hêdî hêdî, te xwe kirî dîsa têwerkira« û bi lez rahişt bavê xwe.
Zibêr û Miho bi dû wan de bêhnçikyayî xwe avêtin hindur. Lê di wê navê re jina Miho hat, ew xewle kir. Bêhnekê kirin piste pist û dûv re jî çûn malê.
Heso rêwîtiyeke ne xweş kiribû û li qereqolê zilm lê bûbû. Sarê jî piştî ku Circîs dîtibû, rewşa ku Heso li qereqolê ketibûyê texmîn kiribû. Destek cilên bin çekan, qutik û kirasek danîbûn ser milê xwe û li ber Heso sekinî. Heso xwe li ser doşekê serpiştkî palda bû. Bîr ne biribû ku şekala xwe derxîne. Temo ji xwe hîç tiştekî wilo ne hatibû bîra wî. Heso qundera xwe di doşekê de dibir û dianî, doşek di heriyê de mabû û Temo jî lê temaşe dikir. Piştî ku Sarê bang kir, »Qîza min Meyro, misînek ava germ, sabûnê û leganekê bîne«, berê xwe da Temo:
»Kuro lawê kerê, tu çi wilo wek bertelaşekî li wir sekiniyî, zû were qundera bavê xwe ji lingan bike! Heso ka rûne ku ez cilên te biguherim...«
Heso dîsa lingê xwe ê seqet û saxlem têkil hev kirin, lingê seqet hilda û bi şid li erdê xist.
»Off yabo!« bi pêxêla Sarê girt, »Bela xwe ji min veke!»got û dahf dayê.
199
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Sarê serqûnkî ket, şahra wê a rawanî ji serê wê pekiya û biskan wek dahfikên kewan xwe bi ser rû de berdan. Porê xwe ê belek şeh kiribû. Li ber xwe ket, lê tişt li xwe çênekir. Bi hemd şahr danî ser doşekê. Kitana xwe da ser hev û por bi kitanê nixumand.
»Heyran ez dizanim ku tahde li te hatiye, lê divê tu bêhna xwe fireh

bikî. Dinya fireh e, Xwedê mezin e. Çerxa felekê geh li jor geh li jêr e. Îro ji wî re xweş ket, sibe jî wê ji te re xweş bikeve. Bêhna xwe fireh bike ez qurban...«

Sarê pîrekeke têgihiştî bû. Baş dizanîbû ku eger ew Heso qanih neke, wê Heso ji niha û bêhneke din li gund şer derxîne. Îcar di destê wê de sîlehê wê ê herî mezin ku temamê aliyên xwe ên pîrekî li himber wî bi kar bianiya. Di vê gavê de ji Heso re aliyê wê ê mêranî pêwîst ne dikir. Û wê jî dizanîbû. Kul û derd û êşa ku Heso wê di sê, çar mehan de bikişanda, di sê rojan de lê gihabû hev. Mejî û hinavên wî helhilî bûn û wek hêtûnê rivîn didan. Sarê melhema canê wî bû. Bi karanîna aliyê xwe ê pîrekî, bi kêmanî hema dikarîbû, rivînan ji êgir bike û şewta gund bitexirîne. Jin gava zana be dikare tesîreke mezin li ser mêr bike. Heso ji Sarê re her tim digot, »Jin şeytanê mêr e. Jin dikare mêr bike balon, dikare dapiçîne, dikare bike wezîr û dikare bike rezîl jî. Keçê Sarê, zû min bike wezîr ku ez fermana vî Circîsî rakim...« Eger di vê civata heso û circîsan de cihê pîrekê bi qasî ê zilêm hebûya, civata wan ewqasî serxweçûyî ne dibû. Ji ber ku li vî gundî hema hema temamê pîrekan xêrxwazî dixwestin. Gelek jinên ku wek Sarê ji mêrê xwe hez dikirin hebûn. Agirê xizaniya ku li canê wan dilîst û can dişewitand, ji mêran bêtir didîtin. Zarokên ku ji destê feqîriyê nexweş diketin û bêdoktor û bêderman li wê navê can didan, dilê dê ji ê bavê bêtir xencer dikir. Jin di navbera mêran de dara ziyaretê bûn. Bi qeweta jinan, di nav zilaman de dikarîbû pevgirêdaneke bi dostanî çêbûba. Lê mixabin dînê wan, bi carekê ve rê li pîrekê girtibû. Hertişt erê hertişt xistibû destê zilêm. Te digot qey ew dînekî ku ji bo zilaman çebûbû.

»Weh çawa Xwedê ne mezin e, me mezinahiya wî li qereqolê dît, hi! Bi telaq ew ji bo ku feqîran pîs bike heye!«

»Pepû pepû, de were û îcar safî bike! Heso jî ji min re bûye feqîr! Hey

agir bi malê keto, ku tu feqîr bî li vê dinyayê feqîr namînin...«
Sarê cilên wî jê dikirin. Di ber re jî laşê wî difirkand. Destê xwe di ser serê wî re dibir û bi rîha wî dilîst.
»Ê ne kalo tu bi xwe nizanî gava tu van kufiriyan dikî, bê tu çiqasî şêrîn
200

dibî lo. Henekê xwe bi Xwedê û tiştê miqedes neke. Hinekî bêhna xwe berde«, destê xwe danî ser zikê wî dewisand û dîsa bi haweyekî devliken axivî, »Hinavên te reş bûne, dew vexwe, mast û nîvişk bixwe. Keçê Meyro, ji kalo re zû qêtix werîne!«
Sarê çi tiştê ku ji dest dihat dikir, lê Heso hîn jî haş ne dibû.
»Ka qaşo birayê te ne çûbû Sitilîlê gilî, zikê min ji kîn û bixzê reş û ê Circîskê te jî sipî bû ha!..«
»Tu dizanî kalo ez dibêm çi, kuro ne be ku ev Circîsê me ewliya be! Me hemiyan çavdêrî li ser rê û mêyên gund dikir, herkes lê bûbû nahtor û kesî jî ew ne dît ku ji gund derket. Baş e ne ewliya be çi ye naxwe, hi?«
Heso di nava xwe de keniya, lê wek a di nava xwe de ne got:
»Erê erê ewliyatî jê dirije, qamboncîkê heram. Ew ewliya be, ez jî pêx-ember im. Ma min ji te re ne gotibû ku mêrik niha li Sitilîlê li ba çawîş rûniştiye?..«
Sarê ew ji guherê hildikişand sirtê û wî jî hîç ne dixwest ku ji guherê derkeve. Lêvên wî ji lêdanê terişî û werimî bûn. Nêm girtibûn. Peşkên xwînê li ser qutikê wî vedabûn.
»Kalo ev çi xwîn e? Lêvên te terişî ne, ne be ku wî teresbavê çawîş li te xistibe, hi!«
»Na, ez bi zarêşê ketime. Hîn ez li malê bûm devê min kul bûbû...«
Dev û lêvên wî ji ê Hûto jî saxlemtir bûn. Li xwedanetanî lêdana ku ji başçawîş xwaribû ji Sarê re bibêje.

Di şevên zivistanê ên reş û tarî de ji bo ku xwe wek nihîtekî mêran bi Sarê bida qebûlkirin, radihişt tivinga xwe û xwe berdida berqefên binya gund. Bi seetan li ber baranê û wê serma dijwar rûdinişt. Di bêhnika ku wê bihata malê, îcar xwe di heriyê de dida û dida û xwe şil û şepa dikir. Dûv re jî ji Sarê re digot:
»Bi qelaç û qelaç ez çûm heta Atxê, ji wir hilkişiyam şikeftên Zivingê, ji wir jî dageriyam besta Bamidê û best û best ez hatim heta duryana Dêrê û Cibiltînê. Howeh li vê ecêbê, ez ewqasî îşev geriyam û geriyam, min ne pêjina insanekî û ne jî a tebayekî kir!..«
Sarê jî jê re sobe dadida, cilên wî diguhert, wek zarokekî li ber destê wî diçû û dihat, ew difirkand û dûv re jî xwe şilfîtazî dikir û laşê xwe bi carekê ve jê re serbest berdida. Ma ne ji xwe, ji xezwê hatibû. Heso bi wan
kiryarên xwe, Sarê bi mêraniya xwe serxweş dixist, û ew jî bi kelaxê Sarê re serxweş dibû. Di vê kêlîkê de xwe li ser perên ewran hîs dikirin. Ji Sarê re digot, »Keçê di vê bêhnikê de gerek em perda dînê Mûsa û Îsa û
201
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Mihemed biqetînin û bibin wek Adem û Hawa. Heyat ev bîstike, bîstika ku çû nema tê. Ez û tu divê ku em ji hev têr têr bibin...« û di her der wê radikir.
Meyro misîn, legan û qalibekî sabûna benkan li ber doşekê li ser çementoyê danîn. Misîn mezin û sifrînî bû. Bilbilîneka wî li gor ên bafûnî hinekî bi jor de bû. Qalibê sabûna ku anîbû hîn bi kar ne hatibû. Destmaleke sor li ser milê wê ê rastê bû. Fîstanekî şîn li xwe kiribû. Porê xwe bi lefahiyeke belek nixumandibû. Devdelingên wê ên kurmanckî li jora bazinên lingan sekinîbûn. Gwîzekan di reşaya odê de wek du loq

nîvişk sipî diyar dikirin. Bejna wê a çinarî di bin fîstanê şîfonî de mîna dara guhîjê bêpêjin dihejhijî. Te digot qey Temo hisn û cemala jina xwe nuh keşif kiribû, bi haweyê nerînên şêxên diltenik li jina xwe dinerî. Av bi devê wî ketibû. Sarê destmal ji dest girt, »Qîza min here« got û lingê Heso ê tehenî xist leganê. Heso dengê xwe ne kir. Sarê hûçikên xwe hildan û dest bi firkandinê kir. Ava şîrgermî û destê Sarê ê gij bi ling xweş hat, mêraniya Heso tevgeriya û di nav şeqan de giha hev. Qereqopkê wî rep bû. Ceriband ku bi kabokan sitarê lê bike. Kabok gihandin hev û navrana şerwalê xwe li ser gilokî kir. Lê fêde ne kir. Qereqopkê wî mîna zirnazîqê gilok hilda û danî. Vê carê jî bi lihêfê nixumand. Devê wî sist bûbû. Eger di vê bêhnikê de peyivîba, miheqeq wê taximên diranan ji devê wî bihatana xwar.

Meyro dîsa hat. Tasek di destê wê de bû.

»Apo kerem bike.«

Heso bêdilî xwe tas ji dest girt. Destê xwe ê çepê danî ser serê xwe û nehişî qurt li ser qurtê li dew xist heta ku tas çikand. Rîha wî hinekî şil bû, bi herdu destan rîh paqij kir û destên xwe jî di doşekê de ziwa kirin. Balîf kişand ber pala xwe û cihê xwe xweş kir. Berê wî tam ket Zibêr. Zibêr guhên xwe bel kirin û ziq li devê wî nerî.

»Erê ma tu dizanî bê li qereqolê Circîsko çi kir, xanim!«

Zibêr ji mereqa bê ka ku Circîs çi kiriye, bêî ku bi xwe agahdar bibe ji ser kulêv herikî ser çementoyê. Bi qasî ku hindik mabû çena xwe bigihîne erdê, sêng xwûz kir, herdu dest çep û rast danîn ser ruyê xwe û çavên xwe

beloq kirin.

Temo ji aliyê malê de hat:

»Yabo ma tu ne birçî yî, xwarin hazir e?« got û li wê navê sekinî.

Di rewşa Zibêr de guhertin çênebû. Sarê jî habela lingê Heso difirkand.

Firkandina bi destê wê ji bo Heso xwarina herî bi qewet bû. Lêbelê Temo 202

fêm ne dikir.
»Yabo ma tu çi dibêjî?«
Heso kulma xwe li doşekê xist û bi zirt got:
»Yabo dibêje ku keliz be jî ez niha naxwim!«
»Heso tu pir betilî xuya dikî. Ma tu şevê din jî raneza qey?«
»Razana çi Sarê!«
Bi vê gotina wî re teqil li Zibêr ket, hinekî din ber pê de herikî. Sadiq hat. Wî guh neda wî.
»Apo tu bi xêrê hatiyî.«
»Wey tu di nav xêrê de bî. Ma tu li ku derê bû heta niha, lawo? Min tu di nav koma zilaman de jî ne dît...«
»Min bi Hûto re dewar rast dikirin.«
Heso pir jê hez dikir. Ax ne ji vî aqilê wî ê rastgo ba, Heso wê ew li ser serê xwe kiriba û hata belkî mezinahiya pizûriyan jî bida dest. Bi tenê tiştek jê dixwest, »Xwe hînî derewan bike!« Çawa ku berberî bêpere ne dibû; berberî bêderew, teşqele û bêbextî û filan û bêvan ji xwe hîç ne dibû. Berberî û pêxemberî pev ne diket. Heta Heso jê re gotibû, »Berberçiyên herî mezin pêxember bi xwe bûn. Nebe Îsa, bibe Mûsa û agir bi ser serê vî Fîrawinê me de bibarîne...« Lê Sadiq jî ne şîretên wî dix-istin serê xwe û ne jî dev ji berberiyê berdida. Exlaq derdixist pêş. Tê ne digiha ku derew, bêbextî û telaqreşî esasên berberiyê bûn.
Zibêr ji Sadiq pirsî:
»Ma îro dora Hûto bû?«
»Ma kîjan rojê ne dora wî ye, wê bibêje? Em tahdê li Hûto dikin. Gavantiya pizûriyan Hûto dike û em mahmela gavanekî jî pê re nakin.«

Sarê bi haweyê ku melhemê li ser lingê Heso şahîk bike, sabûn li ser birînê bir û anî. Heso çavên xwe girtin. Zibêr jî sênga xwe rakiribû, lê hîn jî li ser çementoyê bû.
Sarê:
»Sadiq rast dibêje, em tu alîkariyê bi Hûto re nakin.«
Heso beşişî, kêfa Sarê hat û di cih de gotin sipart wî.
»Bavo hûn ne rast dibêjin, me alîkariya herî mezin pê re kiriye. Me garaneke ker û dahşik teslîmî wî kiriye...«
Zibêr bi haweyê ku wî destek bike, keniya:
»Apê Heso rast dibêje, pêşiyên me bi derewan ne gotine ku fêda gavên nîhandina keran e.«
Heso dizanîbû bibêje, dinermijand û digot.

Sadiq:
»Zibêr tu li ser çementoyê rûniştiyî, çemento xwîna mirov dikişîne, binere dûv re tu ê qarçikî bibî ha. Cihê xwe xweş bike.«
»Zibêr ma ne tu jî carina gavantiyê dikî.«
Temo ne hişt ku Sarê a bi dû vê de jî bibêje.
»Yabo, Meyro xwarin ji te re anî.«
Heso ji nişkê ve çeng bû, kulma xwe li balîfê xist toz ji balîfê bilind bû.Tozê xwe dada qirika wî, kuxuya.
»Lawê kerê, ev hûn çima fêm nakin, ma niha hewara xwarinê ye! Ma min ne gotibû ku ez ê niha nexwim!..«
Sadiq devlikenî got:
»Xebera apê min ne. Temo tu çima fêm nakî? Ma tu nabînî ku siltana wî di berdeye û lingê wî difirkîne.«

Hemû keniyan. Lê Sarê ji hemiyan bêtir keniya.
»Ax Sadiq ax, hema Xwedê emirê te dirêj bike û hew. Kalo ciwan bûye û min jî keçikeke çardeh salî dibîne. Ev keçika çardeh salî ketiye ber û hûn jî wî bi tenê bernadin. Ma wek we ye, Xwedê ji we razî be...«
Sarê tam tiştê ku wî xwestibû got. Heso ji mecbûrî lingê xwe ji leganê derxist. Balîf rast kirin û devdevkî dirêj bû. Sarê vê carê jî pişta wî firkand. Firkandin pir li hesabê wî dihat. Ruyê xwe xist dîwêr, xwe di nav destê wê de xiloxavî kir û bi wê re xwe berda nav salên xortaniyê. Lê Şewqedîn bi bazdan di devê deriyê odê de sekinî, ew gotinên ku Heso pê diloriya, bi dengê tenekê birî.
»Kalo kalo! Kera mala xalê Miho za û dahşikek mê anî...« bêhnçikyayî sê, çar caran li ser hev got.
Heso li qûn rûnişt û bi wahc destê xwe hejand:
»Erê Xwedê emir qesifando, ma ez pîrika kerê me ku tu vê mizgîniyê didî min, hi! Zû ji ber çavên min winda bibe ker lawê kerê! Zilam e ha, hivdeh, hîjdeh salî ye û ji xwe re li aqilê wî binerin! Min navê wî kir Şewqadîn, qaşo wê şewqa wî bida Mekê û Medînê, lê mêrik ji me re bû şewqa gû!..«
Sarê bi ken got:
»Tuxmê te ye Heso, tu gazinan ji kê dikî?« û rabû ser xwe.
Li hewşê qelebalixa zilaman dihat. Seetek derbas ne bûbû ku Heso gi-habû malê. Di eslê xwe de li gor carên ku Heso ji qereqolê an ji bajêr di-hat malê, di vê carê de pizûriyan hinekî bi derengî girtibûn ser. Dudu dudu di derî re derbas bûn û xêrhatin di Heso dan. Qasoyê girs û Xelefê
204

hûrik di derî re dan ber hev, Xelef kumişî û wek çûkekî firiya hindur.
»Lawo çi qewimiye, hêdî hêdî, ez li vir im, ez ne pisîk im ku di şibakê

re birevim, weh! Bêhna xwe fireh bikin, em ê deng û behsên qereqolê ji we re bibêjin...«
Zibêr:
»Bêlome be, bê çiqasî birçiyê gotinê ne! Ji mereqan hindik mabû ku dest û lingên xwe bişikenandana...«
Hindurê odê mîna şevê din na şeva din ji pizûriyan tije bû. Vê carê hin xort û zarok jî hatibûn. Di hikmê pênc, şeş deqîqeyan de rê û rêwanî di odê de nema. Zarok di nav şekalan de rûniştin. Hin xortan li ser qerevîzkan çong berdan erdê, hin li ser lingan sekinîn. Herkesî wek çêlîkên çûkan bêsebir li devê Heso nerî û di cihê xwe de qeliqîn. Heso xwe giran kir, wan jî çixare ji çixarê pêxistin. Dixan ber bi zikê xênî de bilind bû, li hev geriya, bû wek ewrekî qalind û hêdî hêdî xwe berda.
Sadiq:
»Bavo we em fetisandin, şibakan vekin, bila ev dixan derkeve!« got û bilez şibake vekirin. Nûrî jî alî wî kir.
»Heso, ma çawa derbas bû?«
Zibêr berî Heso:
»Xelef hinekî xwe ragire, bila apê Heso bêhna xwe veke. Bi wê nexweşiya xwe û di wê serma dijwar de bi rê ketibû. Ji şevê din ve, di qereqolê de ha ha peyiviye. Hinekî bêhnê bidênê.«
Heso ziq lê nerî û bi hêdî jê re got:
»Tu çawa dizanî ku ez ji şevê din ve di qereqolê de bûm Ebû Sufyan?«
Zibêr xwe ji gotinê xazî kir, bi zorê xwe kenand û di ber xwe de got:
»Ma min wilo got qey apo? Li qisûrê nenere min xwe şaş kiriye.«
Kenêr xwest ku Circîs di bîra Heso de bîne, ji bo ku ew jî mijarê rave bike.
»Gava Sarê gotin bi Circîs re dikirin, Circîs wek bênamûsan serê xwe berdabû ber xwe û bi lez diçû malê. Min xwe ji lêdana wî re hazir kiribû,

lê li himber Sarê hîç kipînî ne ketê...«
Dengê girîniyekê bi ezmên ket, hêviya Kenêr bi avê de çû. Du jet bûn. Bi haweyê ku ezman diqelaştin pir bi hêrs ber bi başûrê welêt de diçûn. Dixana ku bi dû xwe de berdidan mîna marên dojehê di sahiya ezmên de li hev digeriya û ji nişkê vê winda dibû. Yek ji wan gava giha texma gund xwe bi telekî kir, şewqa royê ket ser baskan, ezmên çirûsk veda; bilind bû û daket û hema pê re rêz girt. Digel ku hemiyan dizanîbû ev dengê bal-

afirê ye, ji bilî Heso, hemû bazdan hewşê û bêhnçikyayî hilkişiyan ser xênî. Ên benda din jî wek van kirin. Çakêt û çefiyên xwe ji balafiran re li ba kirin, fîkandin û qêriyan û hey qêriyan. Lê li gor salên rabihurî eva ku niha kirin dîsa jî ne tiştek bû. Di dema ku hîç nizanîbûn bê balafir çi ye, bi dengê wê re piçûk-mezin herkesî xwe diavêt gasînê û digotin, »Ha wi-lo şêxê min lêxe! Em kûçikê te ne kafiran bikuje! Tenterûs ji kêfir sax bernede! Allah, Mihemed, Allah, medet ya şahê li Xiznayê!..« û li sênga xwe dixistin. Ên ku şûr û rimê wan hebûn bi şûr û rim, ên ku debûzên wan tune bûn bi hejan derdiketin qada şer û çekên xwe diavêtin ezmên. Zarokan jî li tenekan dixist. Îcar tew li gundên çiyê, sofî bi sur diketin û xwe di xaniyan de werdikirin. Sofî Dahboyê xerêbanî bi vî haweyî situyê wî şikestibû û miribû. Di wan salan de sofiyan xwe talan kiribûn. Her ku balafirek derbas ba, hemû li hev kom dibûn, kerîyek pez bi xwe re radikirin û diçûn mala Şêx Ehmedê xiznî. Şêx Ehmed jî ji dêvla ku bigo-ta:
»Ey sofîno, navê wî tiştê ku we li ezmên dîtibû balafir e; ew ne ez bûm. Ma insanek çawa dikare wêqas tiriniyê ji xwe bîne! Ew tiştê reş ku jê diçû dixana wê bû. Rîha insên çawa dikare ewqasî dirêj bibe!.. « Wilo nabêje,

vê dibêje:
»Hûn çima min keşif dikin! Qey hûn dixwazin kafir kinêsa we û ometa Mihemed vemirîne!..«
Heso:
»Xelef ma te ji xwe fedî ne kir ku te jî da dû van ehmeqan û tu çû ser xênî! Tu di temenê min de yî. Ma min çend caran tu bir Diyarbekirê ji bo ku tu li teyare û meyaran binerî, hi!«
»Ê ne Heso, te ne dît bê ferca wan çiqasî xweş bû!..«
»Circîs jî derketibû ser qesira xwe û çakêtê xwe ji teyaran re li ba dikir«, Kenêr got û li Heso nerî.
Qaso keniya û dengê xwe hilda:
»Apê Heso, Xelef dîsa ket ha. Bi telaq ku Luqman ew ne girtiba, wê ji derencê bihata xwar û perçe perçe bûbaya...«
Zibêr:
»Pêşiyên me bi derewan ne gotine, ‘aşê dînan bêav digere»got û kenekî qebîh kir.
Ji gotinên wî bêtir, kenê wî bala civatê kişand ser Xelef. Xelef bi awirên civatê şiyar bû ku Zibêr ji bo wî pîs gotiye.
Pêşî xwe bi ser hev de guvaşt û dev lêva xwe kir. Dûv re jî lerizî:
206

»Çi ye Zibêr? Yanî tu dibêjî ez dîn û tirsonek im, ha!« got û bi bazdan ji odê derket.
Çûn û hatina wî du deqîqe ne girtin. Hejekî bi dirî xistibû destê xwe û li ber Zibêr sekinî.
»Heçê ji min û te van diriyan nexwe diya wî jina wî be! De were, bê ji min û te de kî mêr e, hi!«
Hejê wî dirîreşk bû. Her diriyek wek bizmarê sêpiyan qalind û dirêj

bûn. Xelef tam wek dînan devê xwe xist nav çavê hej û gez li ser gezê li diriyan xist. Xwîn bi wê navê de pijiqî û bi ser hej de likumî. Civat pê ve rabû. Selîm bi serê wî girt, hej bi serî re rabû. Gava ku dilikume, diriyek li kerînoka bêvilê rast tê, kerînokê qul dike û di argûşkan de disekine. Ji vir gelek xwîn dihat. Xelef xiliya bû, lê ji ser hiş ne ketibû. Nikarîbû bipeyiviya jî.

»Lewentoyê bînin bidin ber bêvilê...«

»Yabo, Şewqedîn îro meheke ku lewento qedandiye.«

»Kuro lawê kerê, tivingekê di zikê wî de berde. Him em ê jê xelas bibin û him jî em ê bi kuştina wî malikê li Circîs biviritînin...«

Kenêr bi qerf got:

»Dohnê gazê bidin ber bêvilê, dohn ji lewentoyê dijwartir e...«

Miho:

»Ma sîr jî çênabe gelo?«

Sadiq:

»Na lo pîvaz baştir e...«

Simo:

»Ka em ê fitîla deremêtê têxin bivila wî û agir berdênê. Bi Xwedê û pêxember wê zû bi xwe şiyar bibe, kuro...«

Kazim û Selîm di nav xwe re ew birin ber serşokê. Av li serê wî kirin, bi xwe şiyar bû. »Min berdin!« got û bi qapûtê xwe serê xwe ziwa kir. Xwîn ne sekinî. Wî av di dev û bêvila xwe de werda. Bêî ku serî ji qêlik derxîne devê xwe vekir, av hemû bi ser sêngê de herikî.

Heso:

»Xelef here malê û xwe pal bide. Û eger tu di xwe re bibînî êvarî were şevbihêrkê.« Xelef deng ne kir û çû.

»Weh weh ev çi zarok in, zû derkevin! Ji niha de ha! Herin ji xwe re bilîzin û tu carî neyên civatan!« Sarê got û di nav koma zilaman de rûnişt.

Herkesî cih dayê, lê ew li ba Sadiq rûnişt. Ew ê hîn cihê xwe xweş ne kiribû, Hemo hat. Civat ji ber rabû û yek bi yek rahiştin destê wî. Hemo

cilên xwe guhertibûn. Qazaxekî kevin î hirî û pantorekî bi pîne li xwe kiribû. Pantor dirgal û sor bû. Bi giştî bêgore dihat civatê. Vê carê bi gore bû. Bi ser gorên hirînî de coteke gorên naylonî kişandibû. Paniyên herdu goran jî qetiyabûn.

»Çima ev der şilo pilo ye?«

»Ma tu pê ne hisiyayî xanim?«

»Pîro ev dîsa tu çi dibêjî ez fêm nakim?«

»Tew, keçê ma ne Eliyê me ê Betê berî niha girt ser qereqola hidûd, pêncî esker kuştin û sed û nod jî birîndar kirin. Ev cihê şilo pilo hemû xwêhdana wî ye?«

Mahmût:

»Yada Sarê, yekî ji me dirî xwarin.«

»Çima lawo qey ew yek ji we dewar bû ku dirî xwarin; hûn kulibî ne!«

Heso:

»De ka tê derxe, bê ev dewarê kulibî kî ye?«

Sarê fêm kir. Keniya û berê xwe da Sêdiq. Berî ku ew tiştekî jê re bibê-je, Sadiq peyivî:

»Vê carê sebeb ne ez im, bi min nekeve. Berê xwe bide Zibêr.«

»Feqîrê Xwedê Xelef, hûn dîsa ketine kirê wî ha...«

Xelef bahlûlekî bû. Vî jî demekê xwest ku taciriya pez bike. Di dema taciriya wî de mîha herî qelew bi sih û pênc lîrên Tirkî bû. Wî mîha çer-molaqî bi çil wereqî dikirî û bi panzdeh wereqeyan jî difirot. Gava jê re digotin »Xelef tu çima wilo dikî?« Wî jî digot »Ma ne bazar e, weh!« Berî

taciriyê hinekî halxweş bû. Bi taciriyê top avêt û tu carî ne hat ser xwe. Herî feqîrê gund yek jê ew bû. Li şîvê dima heyirî.
Çavên Sarê dîsa dageriyan ser Heso û got:
»Lawo Temo zû xwarina bavê xwe bîne!..«
»Keçê ma tu nafikirî, ez ê di vê hingamê de çawa bikaribim bixwim!..«
»Bavê Temo, ji xwe di hingamê de xwarin xweş e. Ji xweşiya xwarinê gotinên xweş tên bîra mirov. Xweş bixwe ku gotinên te jî xweş bin. Ma ne te digot ku mirovê birçî bêhnteng dibe û hertiştî li binguhê hev dixe. Ev şîretên te bûn. De îcar têr bixwe ku tu me li binguhê hev nexînî...«
Civat hemû bi gotinên wê dikeniya. Ew hîn wilo dipeyivî, Temo xwarin li ber bavê xwe danî. Heso bêî ku civatê dawetî ser xwarinê bike, rahişt perçekî goşt, cûmek jê kir û bi xar avêt devê xwe. Sarê goşt li ser agirê hejikan biraştibû. Goşt hişk û kizîrî çêbûbû. Ji bo ku goşt ji kizîrê bike di rûn de sor kiribû. Heso bi lezet dixwar.
208

Li gor Mîrzoyê mitirb, Sarê şahê civatê bû. Bi qerf û henek û mêraniya xwe civat dihejand. Merd bû. Xêrxwaz û dilbirehm bû. Û eger jinek geryayî ba, belkî bi qasî cesareta xwe ewqasî jî zana ba.
Dengê Meyro ji aliyê malê hat:
»Temo çayê hazir e were bibe!«
Çayê di ber lîstika qumara bi qeremaçan re xweş diçû. Di ber wensa fe-sadiyê re hîn xweştir diçû. Te digot qey heryek ji van gundiyan ji bo ku li ê din siwarê hatiye dinyayê. Heso di derbarê rewşa xwe a qereqolê de, hîn
tiştek ji wan re ne gotibû. Lêbelê wan, xwe bi xwe erd dikirin beyar, şûv, pirêze û gîsîn li ser gîsin lê dixistin. Di guhê hev de dikirin piste pist.
»Ez dibêjim ku apê Heso Circîs rezîl kiriye, tu çi dibêjî?«

»Na Şêxo, ez bawer nakim. Bêhna wî teng e. Eger çiqek di Circîs de kiribûya, wê ji zû de ji me re gotiba...«
»Zibêr, bi rastî jî tu Ebû Sufyan î. Ev gotina te tam ket serê min.«
»Min Hemo tu carî bi du cot gore, heta bi cotek gore ne dîtiye. Kenêr tu ji vê re çi dibêjî?«
»Mahmût, ez dibêjim ku lingên wî di felaqê de nepixandine.«
»Baş e, ez ê tiştekî din jî ji te bipirsim. Ma wê dîsa şer derkeve?«
»Ji niha û hema çend seetên din. Lê ihtimaleke pir piçûk heye, dibe ku şerê îro serguherî sibehê jî bibe yanî. Ax Sarê ax! Hema here malê rahije çifta xwe û bisekine.«
Piştî ku Kenêr wilo got, bêhnikekê li Heso nerî. Dûv re çavên xwe li ser civatê gerandin, serê xwe xist ber xwe û di aqilê insên de fikirî:
»Bêguman di qumarê de mirov her tim qezenc nake. Heta mirov ji qezencê bêtir, winda dike. Gelo mirovê qumarbaz berî ku diket qumarê, bifikiriya ku ji sedî sed wê di vê lîstikê de winda bikira, wê vî mirovî bi qumarê bilîsta? Gava bilîze kêmaqil e. Lêbelê berberiya Heso û Circîs û a ku insên bi hev re dikir, ne wek qumarê ye jî, bêqezenc e. Heso bi vê berberiyê çi qezenç dike? Hîç. Circîs çi qezenc dike? Ne tu tiştî. Mala xwe şewitandine ewqas. Insan bi berberiyê çi qezenc dike? Kesek li xêrê tiştekî
qezenc nake. Ji dêvla ku ewqasî qeweta xwe di malxerabkirina hev de bi kar tînîn, bila vê qewetê di hedayetkirinê de bi kar bînin. Xurt, dikarin vê yekê pêk bînin. Insan çi ehmeq e. Heso gundiyekî nezan e, lê ev ên xwedî dewlet ku êgir li ser serê dinyayê dibarînin, çiqasî bi aqil û tê gihiştîne ge-lo? Hertişt li ber çavên Heso pêdikeve û vedimire, dibîne bê çi diqewime. Û dîsa jî di xwe de guhertinê nake. Ba xuya nake, lê mirov hîs dike. Îcar mirin ne wek bê ye ku bi haweyê hîskirinê mirov tê bigihê û hebûna wê

qebûl bike. Ew tiştekî wilo ye ku heta bi zarokan jî dibînin û jê fêm dikin bê çi ye. Heso digel ku tu qezencê di berberiya gund de nabîne, dîsa jî berberiyê dike. Heso bêaqil e. Lê çima ji ew ên ku bi bombeyekê re sed, du sed hezar insanî di hindurê çend saniyan de dikin qirik, bêaqilên herî mezin nayê gotin? Ma ne ew ê jî bimirana, mirin hebû, dibînin û dîsa jî zilma xwe didomînin. Yanî dibînin ku piştî demekê wê ew kelaxê wan ê nazik û kubar bibe zibil û dîsa jî hev dixwin! Insan bûye insan gelo? Ez bi xwe ne bûme insan. Îcar eger bi rastî Xwedê ev insan çêkiribe, Xwedê doza çi li insên dike? Tiştek ji mirinê pîstir û ji heyatê xweştir tune ye. Mirin qebheta herî mezin e ji bo insên! Xwedê dikarîbû dinya bi qasî kayinatê mezin çêkiriba. Wî çaxî jî bi qaterilyonan insan çêbûba wê dinyayê têra wan bikira. Henekpêkirinek di vir de heye û ji vê henekpêkirinê hin zewqê distînin. Ez jî divê ku henekê xwe bi van insanan bikim û zewqê ji pevçûna wan bistînim...«

Sadiq peyivî:

»Lawo Miho eger bira tu Tecal bî, de ka hema niha tecaliya xwe şanî min bide. Wê Hûto kengî ji ber dewaran bê gund?«

»Sadiq tiştê zor ji min bipirse, ma kî vê yekê nizane. Hûto wê bi êvarkî re bê.«

»Hûto hatiye malê û Hitê şandiye ber dewaran. Îcar ji bo çi hatiye?«

»Qey bêriya kûçikan kiriye.«

»Na. Bêhna goşt kiriye. Wî dît ku Apê Heso hat malê. Û dizane ku wê pîra Sarê goşt li ber deyne...«

»Casim tu dibê qey apê Heso û Circîs bi dizî li hev hatine kuro; bi lezet xwarinê dixwe û car caran jî dikene.«

»Qaso ez jî wek te difikirim. Ev çar seet in ku em rûniştîne û ji aliyê

Circîs de gotinek bê çi ye, ji devê wî dernakeve!«
Luqmên bi dengekî bilind:
»Yabo, de ka bibêje bê tu ê çi bibêjî. Wilehî te cemaet avis kir, bavo!«
Devê derî hat girtin, nîvê odê reş bû. Ev dêwê ha Hûto bû.
»Te çi kir ji dewaran, karê te li vir çi ye lawê berêz!«
»Xalê Heso, ez bi mahna ku xêrhatinê di te bidim hatim. Hitê li ber dewaran e« got û li nav şekalan rûnişt.
»Bila wek te be. Ma Luqman efendî tu û civata xwe dixwaze ez ji we re çi bibêjim? Em li qereqolê bi Circîs re dergûşkî jî ne ketin. Mêrik em xistin û li ser zikê me siwar hat...«
Ev hîn wilo diaxivî Zibêr rabû ser kaban:
210

»Min çiqasî got, kesî li min guhdar ne kir; kesî tiştek ji min fêm ne kir. Eger bi a min bûba em ê berî Circîs li qereqolê bana û ...«
»Kuro tu fîlozofekî yûnanî ye, tu ne ê vî zemanî yî, ji ber vê yekê kesek tiştekî ji te fêm nake. Gerek piştî pênc sed salên din tu bihata dinyayê. Aqilê te pola dibire û ê me jî nikare qûşa kerê bibire.«
Civatê gotineke wilo nuh dibihîst. Heso gava ku hînî gotinên wilo xerîb dibû, bi haweyê ku xwe zana şanî hevalbendên xwe bide, di civatê de digot. Ev yeka ha ji xwe re kiribû tebîhet. Carekê dîsa wilo li ba komutanê hidûd peyveke wek eva niha dike. Komutan jî jê re dibêje »Întel Heso« Heso jî vê gotinê li himber Kenêr bi kar tîne. Lê Kenêr jî bêî ku civat tê bigihê, bi haweyekî kubar erza wî dişikîne. Heso Li ber xwe ketibû û ev tişt terikandibû.
Zibêr bêdeng lê nerî. Sadiq keniya. Miho şaşomaşî bû. Xwêzî di ber Qaso û Casim de ma. Kenêr tevxircilî û devê xwe dagirt. Lê Sarê berî wî rahişt bêr:

»Kalo ez dibînim ku ji doh vir de, tu hînî gelek tiştan bûyî haa. Li min qirikê îcar ev fîlozof çi ye!« Mahdê xwe tirş kir û di nava xwe de keniya. Civat jî hemû keniya.
»Erê lê, ji pêxemberê kafiran re fîlozof tê gotin. Û Zibêr jî pêxemberekî kafirî ye. Ma ne wilo ye?«
Kenêr:
»Apê Heso helbet niha şeytanê wî pêxemberî jî hebû ma ne ji xwe. Gelo şeytanê wî ne Sikenderê Zilqerneyn be?« û kemlan sekinî.
Civat di destê Kenêr de wek hevîr bû; çawa dixwest wilo şikil didayê. Gava ku canê wî dixwest, di cih de bala hemiyan dikişand ser xwe. Xwedî heq neheq û neheq jî xwedî heq derdixist. Ji ber ku li vî gundî cîran bû, zêde ne diajot ser xwedîcihan. Heso hoxeke erd dabûyê. Wekî din jî çend heywanên wî hebûn.
Heso veciniqî. Li himber koma xwe ket rewşeke xerab. Kenêr ew fêm kir. Bi haweyê ku wî xelas bike û jê re bibêje, careke din quretiyên ku tu xwe pê piçûk bixîne neke û di vê navê re jî heyfa Xelef ji Zibêr hilîne, ax-ivî:
»Apê Heso rast dibêje, dema ku li Erebistanê pêxember çêdibûn li Yûnanê jî alimên mezin derdiketin. Ji wan aliman re fîlozof dihat gotin û xelkê jî ew wek pêxember ji xwe re qebûl dikirin. Fîlozofên wan ji xwe hez dikirin û wek parsekan goşt û brinc ne di bêrîka qapût û paşila xwe de, di sêniyê de dixwarin.«
211
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Xwîn li Zibêr vemirî. Goşt û birinca ku du roj berê dizîbû hat bîra wî. Pala xwe da dîwêr û çavên xwe kutkutandin. Dixwest civatê biterikîne. Kenêr ajot ser:

»Fîlozofan goştê pez ne dixwarin, masî dixwarin. Birinca xîç ji xwe hîç ne dixwarin. Dilbirehm bûn. Ne wek min û Zibêr fesad bûn...«
»Eferim Kenêr, ez çavê te bixwim, ha wilo! Birayê min, wextê derewan û fesadiyê derbas bûye...« Sarê destê xwe bi teqil dihejand û digot. Kenêr guh lê ne kir. Ji bilî sê xortên ku di qorziya derî de li ser pêyan sekinîbûn û li ser kaban dipeyivîn, çavên herkesî li ser wî bû. Hûto jî car carê bi ê tenişt xwe re diniqirand. Miheqeq ew niqirandina wî jî wê li ser pariyê goştê ku di sêniya Heso de mabû...
»Zibêr fîlozofekî wilo ye nizane ku ji birincê kaxet çêdibe...«
Zibêr li ser çarlepikan meşiya û bi herdu destên wî girt:
»Kenêr, ez di bextê te û bavê te de bes e! Ez dizanim ku tu li ser Xelef ji min zivêr bûyî. Lê me tiştekî ewqasî xerab jê re ne gotibû...«
Hemo:
»Temam temam Zibêr, ew mesele qediyaye. Bila dirî ne xwaribana. Zarok jî wek wî nakin...«
Kenêr sekinî. Selîm çixare avêt ber. Rahiştê, piştî ku serikê wê di nenû-ka tilaya xwe a girdikê de tiktikand, pêxist. Sarê jî bi dilovanî lê temaşe dikir. Nizanîbû ku di dilê vî fesadî de çi zîhayên maran raketî ne; li bendî wê ye ku ji odê derkeve û ew jî zîhayên xwe berde wê navê.
Di bin sefirna axo de, xortan bi xar û pereyan dilîstin. Komeke xortên din jî li bendî ku ev lîstika xwe biqedînin û ew jî bi qotikê bilîzin, bêsebir li ser pêyan sekinîbûn û dikirin pite pit. Şewqedîn bi xaran xweş dizanîbû bilîsta. Lê ne bi qasî Hûto, Sadiq û Zibêr. Bi giştî qana pêşî a wî dibû, bi wî lîstik radibû. Gindorkî xar bi kar ne dianî, her tim bi şel lê dixist. Yek jê fenek bû. Gava pişta wan diket wî, xara xwe nêzîk digindirand. Lê hemiyan jî ew nas dikir bê çi mal bû. Her roj dilîst û dîsa jî hînî lîstikê ne dibû. Di lîstika kaban de jêhatî bû. Fen jî ne dikirin. Pere rib rib çiki-landibûn. Pirê riban zer bûn. Binê sefirnê hinekî tirmalî bû; bi tenê riba

dawî diket tirmêl. Mirîşkan carina li nav lîstika wan dixist, hertişt tev li hev dibû. Di van kêlîkan de moralê wan xerab dibû û bi hêrs êrîşî ser mirîşkê dikirin. Di lîstikên xar û pere û kaban de, pişta gelek mirîşkan hatibû şikenandin.
Du xortan ji du milan ve çayê digerandin. Ji bilî qedeha Heso ên din hemû jî wek ên qahwexana Ebû Kermoyê mêrdînî, piçûk bûn. Tepsiya 212

qedahan yek jê legan bû. Çaygerê ku bi legan lawê Selîm, li ba Bedirxan awiqî. Bedirxan çavê xwe li qedaha herî tarî digerand, lê Meyro jî hemû bi qiyas û tenik dagirtibûn. Bi qahr rahişt qedehekê, dilopek çayê bi ser çîmê wî de niqutî. Çeng bû, qedeha di dest de bi ser sêngê de hat xwar tam çeng bû û hertişt qewimî. Deh, panzdeh qedehên ku di leganê de bûn bi ser wî, Miho û Nûrî de belav bûn.
Heso bi ax û wax:
»Qedeh bûn, we ew jî şikenandin. Min ew qedeh ji Mêrdînê bi qiyameteke pere kirîbûn. Bê çi qedehên delal bûn. Çiftî ji ber we tê çiftî! Erê ma wê çima neşikînin yabo, ne ji bêrîka wan derdikeve... «
Sarê:
»Bi cehnema qedehan kirî! Laşê wan şewitiye û tu jî bi dû pereyên qedehên xwe ketiye...«
Zibêr di ber xwe de got:
»Pêşiyên me bi derewan ne gotine, ‘hin li mirinê û hin jî li kirinê ne’, hema şikestin wê çi bibe qey! « Lê hema hema hemiyan dengê wî bihîst. Heso birûhên xwe hildan û awir tê firandin. Zibêr xwe li ber ne girt, berê xwe jê guhert û pişta situyê xwe xurand.
»Gotinên te ê pişiyan carina wek nanê garisî ne, hevdu nagirin...«
Sê xortên ku di devê derî de sekinîbûn, mîna ku wê bi kaban bilîztana

keniyan û ji odê derketin. Bi çûna wan hindur hinekî din rohnî bû. Hûto ji berî niha vekirîtir xuya kir. Bêhna mîza serşokê û şekalên wan hîç tesîr li kesî ne dikir. Sobe ji êzingan dagirtî bû, guvguva agirê sobê bû. Civata wan a niha ne mîna a wê şevê bi hingame bû. Herkesî dixwest ku Heso û Hemo bipeyivin. Bi mereq li devê herduyan temaşe dikirin.
»Dema ku me li vê derê li ser gilî û negilîkirinê qirika hev diqelaşt, Circîs gihabû qereqolê û kar qedandibû jî. Lê dîsa jî pir baş bû ku em jî çûn. Eger em ne çûbana nig wî teresî, wê cendermên wî ji doh de li vir bana û wê em hemû garankî heta bi Sitilîlê bidana ber xwe. Çawîş ji me û wî destê wî girt. Tew bi ser halan de hindik mabû ku me bişîne mehkema Nisêbînê û dûv re jî hepsê...«
Kenêr got:
»Apê Heso ev ne bû, hizira me ji qebheta me mezintir bû. Îcar gava ku hizir ji qebhetê mezintir bû, wî çaxî jî berî we divê ku ez ji vî gundî bar bikim« û rabû ser xwe ku here.
Dualî lê xist. Tahn da Heso. Bi rabûna xwe re jî xwst ku wî piçûk bixîne. Lê Heso jî ne hindik bû. Piştî ku jê re got »Li cihê xwe rûne!« û ew

jî rûnişt, dest pê kir:
»Circîs ne ji me camêrtir û ne jî mêrxastir e. Em dikarin devê wî û sed bavê wî biçirînin. Lê lawo me hîç ne xwest û em naxwazin ku mesele bigihê wê derê. Kûçik hestiyan dixwe, hesabê qûna xwe dike. Ew kûçik e wilo difikire û em insan in!.. Eger min bizanîbûya wê bi kuştina wî gund xweş bûba, min ê ew bikuşta û ez ê di hepsê de raketama. Lê êz ê kê bikujim û kê nekujim; her lawekî wî bi xwe Circîsek e! Em êlek hene, bi kuştina çend kesan ji wan em ê vê êlê di nav lingên teresan de bihelikînin. Erê

ew bêşeref çima wek min nafikire û dev ji gilî û milî bernade! Em ê bi hev re berberiyê bikin ser çavan, lê em ê li hev gilî nekin...«
Sarê ji kêfa re hindik mabû bifire. Di dawiyê de xwe ne girt, li ser doşe-ka wî rûnişt û destê xwe li kaba wî xist:
»Eferim bavê Temo û Bedirxan! Kuro bi rastî ji doh û vir ve tu gelekî bi aqil bûyî, tu min ditirsînî Heso. Ev ne be ku mirina te nêzîk bûbe! Tu wek wan ên ku li ber mirinê ne, gotinên xweş û maqûl dikî...«
Lepta Sarê ûjdanê Kenêr ne rehet kir. Çîmên xwe ber bi zikê xwe de kişandin, herdu destên xwe danîn ser kabokan, ziq li wê û Heso nerî û di şexsiyeta wê de êrîşî ûjdanê zilêm kir:
»Sarê pîrek e. Û ev pîrek bi her haweyê xwe ji me û bavê me çêtir e. Sarê mê ye. Yanî dê, xweh, keç, xaltîk û metik e. Ji dê şêrîntir çi heye gelo? Ji qîza mirov çi xweşiktir heye? Û ya xweha mirov? Baş e, îcar ew çi ûjdan bû ku rê ne dida pîrekê û ne dihişt ku pîrek beşdarî nav kar û barê civakê bûba! Wî xwedayê wan çima ew zilm qebûl dikir? Sarê mê û Heso jî nêr e. Yanî çi! Lê Heso jî dikarîbû mê bihata vê dinyayê. Pêxember dikarîbûn mê çêbûbana. Îcar mêçêbûn çima sûc bû qey? Lê wê nebana pêxember ew tiştekî din e. Aha tam di vir de, bi nêrbûyina xwe qada pêxemberiyê bi dest dixînîn û hîç jî fikir ne kirin, ne dixwestin bifikirin, ku mê çêbûbana wê ew meqamê bilind bi dest ne xistibana. Çima saniyekê mê ne dihizirîn? Insan çi ye? Nêr çi ye bibêje? Mê jî dikarîbû wilo bûba. Mê bi nêr û nêr jî bi mê hebû qaşo. Ji bo insên nahmeta herî mezin ew kêlîk bûn. Xwîn di xwînê de wek pêlên behrê radibû û di dawiyê de jî sirûşt xe-lat dibû. Yek diteqîne yek jî digire. Eger mezinahî di teqîn û girtinê de be, girtin mezintir e ezbenî. Bi rastî ez jî carina çi ehmeq dibim. Min çi jê ye! Ma tu ji Xwedê û pêxemberan mezintirî ku tu jî pê li Sarê û cinsê wê nakî, hi!« û çeng bû. Lêbelê kesî ferq ne kir.
Bedirxan got:

»Yabo, ev ji me re ne kêmanî ye ku tu wilo dipeyivî, ev tu li ser hişê xwe 214

yî? Eger Circîs van gotinên te bibihîze, wê esker her roj di ser zikê me xe...«
»Kûçik lawê kûçik, tu çawa dikarî wilo ji bavê xwe re bibêjî! Ev kengî wilo tu ji bavê xwe fêhmantir bûyî! Fesad lawê fesadan, de here tivingê di
serê xwe de berde ku em bi wî termê te ê pîs hemiyan têxin hepsan û malê
wan ji xwe re talan bikin! Hûn ê bikujin, ji xwe re di hepsan de rûnin û em ê jî di nav lingan de biperçiqin, ha! Em qebûl nakin! Di wê kuştina we de, xelk hatin ser cihê diya te bênamûs!«
Bedirxan serê xwe berda ber xwe û di bin çavan re li Selîm nerî.
Luqman, Selîm, Temo, Hemo û Zibêr bi hev re peyivîn. Lê dengê Luqmên ê qalind dengê wan fetisand û wî domand:
»Circîs wek mirîşkê ye, tu ji mirîşkê re çiqasî dibêjî 'kişe mîratmayê', dîsa jî fêde nake. Ew wek xwe dike. Ma me gilî lê kiribû ku çû ba çawîş diya min ê, hi?..«
Hemo xwe di ber re rakir, wî jî rê dayê. Dizanîbû ku wê ji wî hîn xweştir bibêje.
»Circîs yek ji me birîndar kir, heydê em ê bibêjin şer bû xem nake; lê ma li qereqolê jî şer bû ku bi cendirman ez kirim felaqê û binê lingên min hemû teqandin! Circîs xwe ji ser me venakişîne heta ku em jî xwe ji ser wî
vekişînin...«
Selîm bi xirecirê gotin ji dest wî girt:
»Axe ketin nav me, em bi wan re li hev hatin. Circîs ev lihevhatin di deh

rojan de têk bir. Şêx ketin nav me, em dîsa pê re li hev hatin. Lê mêrik jî di bîst rojan de li me qulipî. Seyid ketin navbera me, em pê re rûniştin. Lê wî çikir, seyid hîn ne gihabûn Zêwikê, bizina xwe berda nav nîskên me û dijminaya xwe dîsa serast kir. Em li ser destê melê li hev hatin. Îcar hîn du rojên me ne qediya bûn, bi golik êrîşî ser me kir. Ma mirov golik berdide nav genimê şîn, hûn bi qedirê Xwedê kin, hi!..«
Heso guhdar dikir û Sarê jî di nav re yekliban siqêf bi wan re dikir.
Sadiq rabû, keniya û bi haweyekî devliken peyivî:
»Selîm, te pevçûna zarokan ne got, şerê li ser elokê te ji bîra kir; di wî şerî de Nûrî ji mirinê filitîbû, ma qey nayê bîra te? Me li ser dora avê sê seetan li hev xistibû û di wî şerî de serê te şikestibû. Ma ez hîn jî bibêjim?«
»Oh Sadiq tu jî lo, a te jî hema henekpêkirine.«
»Çima henekpêkirine bavê min? ku ne wilo be, bibêje ne wilo ye...«
Zibêr xwe reş û şîn kir. Dixwest ku mijara li ser dipeyivîn ji cidiyeta xwe nekeve.

215

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Pêşiyên me bi derewan ne gotine 'Tebhê şîrî heta bi pîrî'; ew fesad çêbûye û heta ku ew hebe wê wilo fesad jî bimîne. Ew ji bav û kalan de dijminê malbata me bûye û heta ku zuryeta wî hebe jî, wê vê dijminayê bidomînin. Wî xwîna me rijandiye û qesasê serê me ye...«
Niyeta wî û sekinê hîç tune bû. Eger Seyidxanê cîran xwe neavêta wê navê, ew ê hîn gelek tiştên din bigotana.
»Zibêr tu bi haweyê mîna ku me hemiyan cilika bênamûsiyê kişandiye serê xwe, dipeyivî. Dijminê me mirovin çawa ne, em bi hemî dizanin, hinekî bêhna xwe fireh bike ezbenî...«
Hûto serê xwe berdabû ber xwe, kûr difikirî û hûr didirût.

Kenêr:
»Tu çi difikirî Hûto?«
Hûto li Sêdiq nerî.
»Tu çima li min dinere, li xalê xwe Şeytan binere. De ka bibêje, xalê te Şeytan mereq dike. De bibêje bê tu çi difikirî? Destê xalê te dirêj e, digihên heta bi çiyayê Qahf.«
Hûto berê xwe tam da Sêdiq û bi Kenêr re peyivî:
»Xalo, ez di insanên berî hezar milyon salî de difikirîm.«
»Eeehew, ez ev zir şeytan nikarim ewqasî bifikirim malneketiyo! Qey çavê te lêye tu meqamê min ji min bîstînî, hi?«
»Haşa xalê min ê Şeytan, ez kî me ku şûna te bigirim. Yekî wek xalê min ê Heso û apê Circîs nikarin şûna te bigirin, îcar ez ev rebenê ha ez ê çawa bikaribim! Erê xalo, dilê min bi wan insanan dişewite.«
Hûto gotina »apo»wek heqaret didît. Heqaret li Circîs dikir.
»Çima?«
»Ma çi ne çima, di vê dema me de hezar şiklê xwarinê hene, wan ev xwarina wilo milyonşiklî nexwar û hemû mirin, howeh kuro!« û li Heso nerî.
Civat bi ken li piştê sekinî. Heso ne dikeniya.
»Lawo Temo wê sêniyê ji tenişta wî rake. Di sêniyê de goşt dibîne û tiştên xerab tên bîra wî, Xwedê me jê bisitirîne haho ev çi teba ye!..«
Sarê rahişt sêniyê û li ber danî. Çênîkek goşt tê mabû. Heso nan ne şikenandibû. Hûto ew piçika goşt xist nav nên û kişiya ser.
»Meyro Meyro, qîza min goştê ku min ji Temo re biraştibû û du nanan zû werîne odê...«
Ji bin sefirna axo bi haweyê ku xortan êrîşî hev kirin, dengê qelebalixê hat û di cih de jî sekinî. Xuya bû wan ên ku bi xar û pereyan dilîstin, cih
216

ji ên ku wê bi kaban bilîstana re berdabûn.
Li tara jêr kûçik berdidan hev. Xort, zarok û zilam derketibûn temaşê. Keft û lept û dengê qîre qîr û qîje qîja wan, sohbetên ereban di bîra mirov de dianîn. Sê kûçik berdabûn kûçikekî. Herçar jî di xwînê de bûbûn kulîlk. Ji hersê kûçikên hevgirt, yek jê ji lingekî xwe î paşî dikuliya. Xwe nikarîbû bida ser lingê xwe. Mirov dizanîbû ku dev lingê wî bûye. Devlêkirina lingan pîs bû, zû rehet ne dibû, carina jî hîç rehet ne dibû, seqet dima. Ji ber vê yekê jî xwediyê wî ew dikuşt.
Simo:
»Apo, em nikarin vê bênamûsiya ji sê rojan û vir ve daqurtînin. Circîs sê, çar derb pev re li me xistine. Wî a xwe ne carekê, pêncî carî, heta belkî sed carî di me de kir! Û tu hîn jî dixwazî ber bigirî; xwîn di birînan de ne-ma disekine...«
»Êh, bê çi xweşik e lawê tirê. Yanî tu dibêjî em ji hev re derkevin ha? Bêhna xwe fireh bike, wê ew jî bibe.«
»Mêrik li me teng dike, apo.«
»Rast e, mêrik li me teng dike. Di berberiyê de gava aliyekî karê xwe ji alî eskeran ve saxlem kir, dibe ku wî çaxî rev jî bi dest mirov nekeve. Ev pêleyeke ku Circîs daye dû vê yekê...«
Kenêr bi lez destê xwe hilda:
»Aha apê Heso, tam di vir de ez ê tiştekî bibêjim!« Wî rê dayê.
»Îcar şîrê di mexmelê de, heyvankirî be ne heyvankirî be, ku te kil kir, wê qeymax negire.«
Heso tam fêm kir. Gotina wî bi Sarê ne xweş hat, lê fêm jî ne kir. Bêhna xwe teng kir û rabû ser xwe:
»Kesî ji bo Xwedê li vî gundî nemaye. Herkes bûye korfesend û li xer-abkirina mala ê din digere. Hûn li himber hev dîk û li himber eskeran jî

mirîşk in. Esker dest diavêjin jinên we, malê we dixwin û we talan dikin û hûn jî li malwêrankirina hev digerin. Heyvanê namûsê bi we yekî jî re tune ye yanî. Eger namûsa we hebûya, we ê qûnên xwe ji eskeran re bel-belot ne kiribana« got û meşiya.
Zibêr peyivî, ew sekinî û lê guhdar kir.
»Jinapê, esker dewlet e; mêraniya li himber dewletê ehmeqî ye. Dewlet çi bike ji mirov, ne eyb e.«
Sarê xwe aciztir kir, xwe hinekî tewand û bi herdu destan:
»Ê ne tu ji xwe fedî nakî, tu jî zilam î hi! Gerek ê min bi te û ê te jî bi min ve ba...«
217
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Heso xwe aciz kir û bi hêrs got:
»Erê keçê pîrê, me fêm kir, de here bi rêya xwe de! Temam, ê te bi ê me hemiyan û ê me hemiyan jî bi ê te ve, em bênamûs, weh!«
Sarê berê xwe da Heso, Sadiq pê ve rabû û xwe xist bin çengê wê.
»Pîra delal, baştir e ku ê te bi te ve û ê me jî bi me ve be. Bi telaq gava me bi hev guherd, wê heyvanê namûsê bi te re jî nemîne« û bi hev re ji odê derketin.
Dengê qemyonekê ji ser rêya Îpekê dihat. Mîna ku bi bar bû û barê wê jî zêdî qeweta wê bû, tiriniyeke bi hêl derdixist. Deng ji pevçûna kûçikan biliya bû. Herçar kûçik jî heta ku hal di wan de nema bû li hev xistibûn û birîndar bûbûn. Meyro bi bêrê pirika hewşê diavêt ber dîwarên sênca hewşê. Ev karê Temo bû, lê destê wî ji civatê ne dibû ku here alî jinikê bike. Fesadî hebû. Temo ne mirovekî fesad bû, lê ne ku kêfa wî ji fesadiyê re jî ne dihat. Di vî warî de bi zewq li hevalbendên xwe guhdar dikir. Ne şerxwaz jî bû. Lê gava diqewimî jî dida pêşiya herkesî. Di bin tesîra diya

xwe de bû û bi a bavê xwe dikir. Bavê jê re çi bigota ew bû. Di rastiya xwe de Temo insanekî saf bû. Eger ne ji Heso ba belkî tu carî jî berberî ne kiri-ba. Heso carina qerfê xwe pê dikir û digot:
»Ev Temoyê me li jina xwe hatiye; kî jê re çi bibêje dikeve serê wî. Eger ev lawê yekî wek Circîs ba, niha ji zû de kuştî ba. Îcar qirdê wî heye ku ez bavê wî me...«
Zoravî bêkêr û zexel bûn. Derdora gund tije kevir bûn, besta gund bi zixur û qûm bû û di xwe re ne didîtin ku hewşên xwe zixur û qûm bikin. Di hewşê re heta ku derbasî hinduran dibûn, şekalên wan di pirikê de di-man û hindur bi pirika şekalan genî dikirin. Ji xwe genî bûn, îcar bi wê pirika pez û dewaran xwe hîn genîtir dikirin. Pir tahde li zarokan dihat. Zarok bi giştî xwas digeriyan. Û êvaran jî ling neşûştî radizan. Ev gundî ewqasî zexel bûn, di xwe re ne didîtîn ku mirarên xwe dûrî gund biavêjin. Havînan li ser xaniyan radiketin û heywanên xwe ên mirar, diavêtin pişt xaniyan. Li ber wê bêhna genî şevbihêrk digerandin û fesadiya hev dikirin. Ji destê fesadiyê qulên bêvila wan xitimî bûn; mirêr di bêvila wan de wek lewentoyê bêhn dida. Dîsa tahde li zarokan dihat. Giriyên zarokên vî gundî ên ku hîn bi ser lingan ne ketibûn, di şevên havînî de ji bêhna miraran heta ku dibû sibeh, ji hev qut ne dibû. Razana zarokan bi haweyê xilmaşê bû.
Mele Salar hema hema berî niha beşdarî civatê bûbû. Li hewşê pêrgî Sarê tê û tev de têne odê. Ji bilî Heso herkes ji ber wî rabûbû û cih jê re
218

xweş kiribûn. Bi hatina wî kêfa Sarê hatibû. Lê teng bûbû, ji mamoste û mele divabû yek bi hewara wê ve bigiha. Mîrzo jî ne xerab bû. Ew û civat bi hev dikeniyan; civatê bi henekên wî dikarîbû xwe ji bîr bikira û îro şer neba. Mîrzo heta dikarîbû govend jî bigeranda. Hûto û temamê xortan

li vir gihabûn hev. Lê îcar ku Mîrzo bixwesta, di hikmê deh deqîqeyan de dikarîbû şerekî mezin jî li dar xista. Di vê dema ku pizûriyan ava serê hûran disincirandin, şerê Eliyê Betê û Hemê Gozê ji bo yekî wek Luqmên ku êrîş bibira ser malên hûran, bes û heta gelek jî bû.
Mele Salar:
»Înşelleh baş derbas bû, Heso.«
»Weh çawa baş derbas ne bû seyda, me dendik jê berda bi telaq. Circîs berî me gihabû ser mûlidê; goştê ser girarê hemû xwaribû. Eh, me jî çend kevçî girar xwar yanîka. Na na, bi şêxê li erdê Bexdê, me girar jî ne xwar, îcar çima em derewan li xwe dikin.«
»Bêhna xwe fireh bike, tiştekî baş ji xerabiyê dernakeve Heso. Dawiya xerabiyê dîsa xerabî ye. Em ê di rojekê de hemû bimirin û ev dinya wê ji kesekî ji me re nemîne. Mirinê di bîra xwe de bînin ku hinekî bêhna we fireh bibe. Zarokên we hûr in, dewlet zalim e, li jin û zarokên xwe bi-fikirin. Di berberiyê de têrî tune ye, şexsiyet li ber lingan diçe, mirov li ba Xwedê û pêxember rûreş dibe...«
»Seyda mîna ku hayê te ji tiştekî tune be, tu wek wan melên ku nuh tên gund û gotinên xweş dikin, dipeyivî. Bila mirin, Xwedê û pêxember hinekî bê bîra Circîsko jî. Ma Xwedê û pêxember qîma xwe tînin ku hin êrîşî te bikin, ber te bikolin û te di koncalan de werkin û tu jî deng nekî hi? Navê bêdengiyeke wilo, ne bênamûsî be, çi ye naxwe!«
»Ezbenî çima tu hinekî ji aliyê wan de jî li meseleyê nanerî? Ew xerab hûn baş bin. Bi başiya xwe wan hedayet bikin. Heywana çiqasî berî be ku te nermî şanî da, wê xwe nêzîkî te bike. Ew heywan e fêm nake, bi goti-na xweş û nerm kedî dibe, em insan in û fêm dikin çima em ê hedayet nebin. Bi gotina xweş keftar ji qulê derdikeve. Îcar ku te xwarin dayê, wê ew ê jî mîna kûçik kedî bibe. Heşî Circîs, ez van teşbîhan ne ji bo xwe, te û wî dikim, ji bo temamê insanan dibêjim. Ji bav û kalan de hûn bûne di-

jminên hev û we hevdu kuştiye. Erê hûn bi qedirê Xwedê kin, ka we çi ji wê kuştinê fêm kir. We ji belengazî û feqîrtiyê pê ve çi bi dest xist?«
Kenêr bi ruyekî sar û qermiçî:
»Seyda di her mexlûqî de hinek xerabî heye. Tu bixwazî nexwazî, ew xerabî wê her hebe. Ulemayên wek Îmamê Xezalî vê yeka ha dibêjin.

Çavnebarî di insên bi xwe de heye.«
»Rast e, lêbelê ezbenî vê jî dibêjin, mirov dikare rê li ber bigire ku ew xerabî har û mezintir nebe. Mirov bi xerabiyê najo ser xerabiyê; xerabî bi xerabiyê hedayet nabe.
Kenêr:
»Seyda lêdan jî xerabî ye, ma ne ji xwe.«
»Helbet lêdan ne tiştekî baş e, ew jî xerabî ye.«
»Li nexweşxana Xerpêtê, textor li dînan dixînin û hin dîn jî bi vê lêdanê terbiye dibin. Ma tu ji textoran çêtir dizanî seyda?«
Berî melê Zibêr xwe lê qewimand:
»Kenêr rast dibêje. Bav û kalên me jî dibêjin ku dîn ji dînan ditirse; dîn dînan dibîne debûzê xwe di bin qêpût de vedişêr e.«
Simo rabû ser kaban:
»Deremêt deremêt, em ê deremêtekê di bin xaniyê wî segbavî xînin; ku ne bi deremêtên min ê atomî bin hûn ê tu carî nikaribin pê...«
Luqman rabû ser pêyan, şifqa xwe li erdê xist berê xwe da melê û destê xwe ê rastê hejand:
»Circîs û zaroyên xwe jî zilam in yanî! Bila bên em ê ji hev re derkevin çiyê. Li çiyê wê qûna gewr û reş ji hev xuya bike. Wilehî ez ê wilo bi baz-dan êrîşê bibim ser kozikên wan ku...«

Melê ne hişt ku gotina xwe biqedîne, mîna wî rabû û destê xwe hejand: »Kuro a te jî mêranî ye, hi! Li cihê xwe rûne, ya jî here bazde ser jina xwe! Hema aniha rabe ser xwe û ez û te em ê ji hev re derkevin çiyê!« û xwe rakişandê.
Sarê ket navbera wan:
»Seyda ez bi gorî here mala xwe, wê te jî xir bikin. Melayiketan nikarîbûn bi şeytên, îcar tu ê çawa bi van şeytanan serî derxî! Hemû çûne ser kufrê bê bêlome be! Xwedê bike yek bibe taştê ê din jî bibe fîravîn, dev
ji wan berde û here kitêbên xwe bixîne« got û civat terikand.
Mele, her gava ku di civata pizûrî û hûran de rûdinişt, pêşî hinekî dînî dipeyivî; ku lê germ dibû, îcar wî jî tam wek wan lê dixist. Her melê ku dihat vî gundî, gundiyan ew di hikmê pênc, şeş mehan de dikirin wek xwe. Mele wek yekî mumin dihat gund û fasiq ji gund diçû. Hinekan ji wan azan jî nema dixwendin; bêdestlimêj mêj dikirin. Mele Ehmedê kinikî bîst û pênc salî bû, li vî gundî meletî dikir. Wî jî mîna ku bavê wî li kinikiyan dikir, xwest ku li gund xutbê li dar bixîne. Wazên mezin dikirin, Xwedê û pêxember ji ser zimanê wî ne diket. Doza ku gundî çi-
220

ma nayên mizgeftê li gundiyan dikir. Yanî bi kurtî li gor gundiyan, ev mirov bûbû bele. Kenêr li ser daxawaziya Heso, bi dorê ket ku wî bixirîne ya jî hedayet bike. Kenêr, Mele Ehmed hînî diziyê kir. Mele kirin dizekî wilo ku bê yasitar! Ji roviyan bêtir mirîşk û elok ji ser hewşan direvandin. Di dûmahîkê de têra wî lê xistin û ji gund berdanê. Lêbelê Mele Salar mirovekî bi aqil û endamê PDKTyê bû. Welatperwerekî temam bû. Di eslê xwe de dostaya wî û Sarê, ji ber vê welatperweriya wî dihat. Herdu bendan jî jê hez dikirin; qîmet didanê û lê guhdar dikirin. Lêbelê

gundiyan dîsa jî wek xwe dikirin.
Sadiq:
»Hûto de ka tu tiştekî bibêje!«
Hûto keniya û li Zibêr û Miho nerî.
Kenêr:
»Bibêje bibêje, Zibêr û Miho miheqeq tiştin kirine.
Hûto hîn bêtir keniya.
»Temam ez ê bibêjim. Xalê Şeytan, wê şeva ku we hofk li odê gerandibû, apê Sufyan û apê Miho piştî ku hofk belav bû çûn nav rez nêçîra reşêlan. Du çewal ji goştê teyrikan dagirtibûn û yek jî nedan min.«
Hûto, zarok ba zilam ba, dema ku jê aciz bûba, jê re »apo« digot.
Siqêfên wî hemû »apo« bûn. Di pevçûnên gund de bang Circîs û Bedran dikir, »apo« digot û kevir di wan werdikir.
Civatê awir di Zibêr û Miho de vedan. Tiştekî ne baş kiribûn. Gerek civat bi nêçîra xwe agahdar kiribana. Çimkî nêçîra nav rez ji bo herkesî bû. Bi civatê re bêbextî kiribûn. Divabû cirm bûbana.
Herduyan bi hev re:
»Ê hema bi Qurana ser çonga seyda, Hûto derewan li me dike!«
»Qurana min bi we vede hûn derewan dikin. Hûto ahlê Xwedê ye û insanekî mezin e, nizane derewan bike. Ma ew rast dibêjin, tu derewan li wan dikî, Hûto?«
»Xalê mele, ê hema bi Qurana te ez rast dibêjim. Bêhna goştê reşêlan di bîra xwe de bînin û wan bêhn bikin. Ma ne wilo ye xalê min ê Şeytan? «
»Kuro bi Qurana min, tu rast dibêjî lo; ên derewîn ew in. Kenêr wan bêhn bike!«
»Seyda ji xwe pêwîst na
ke ez wan bêhn bikim, ez reşêlan di çavên wan de dibînim. Ma qey dengê wîze wîza wan nayê we?«

Heso:
221
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Hey topek li mala we keto, Hûto kengî derew kirine, heta ku li we derewan bike. Berî hertiştî ji xwe mêrik hîç nizane derewan bike. We du çewal teyrik kuştine, îcar hûn ê perê çar çewal goştê teyrikan bidin.«
Heso di cih de ew cirm kirin. Di hesabên wan de pevçûn hebû, lê li tiştekî din qelibîn.
Sadiq:
»Pêşiyên me dibêjin ku 'te nanek xwar, perçekî jî bide hevalê xwe.' Îcar we ne nanek, du tenûr nan xwariye. Ji wan teyrikan tiştê ku wê pişka min biketa, ez hemî didim Hûto.«
Mele jî keniya:
»Pêşiyên me dibêjin ku, 'diya dizan du tiran dikin, yek ji kêfa û yek jî ji tirsan.' Gava we goşt xwar xweş bû, ne wilo? Dawiya fesadiyê ev e. Xwedê
ecêban pêş we dike û hîn jî hûn tiştekî ji xwe fêm nakin. De îcar bixwin!«
Zibêr destên xwe bi hev difirkandin û mîna ku ji xwe fedî kiribe serê xwe berdabû ber xwe. Hîlekarî dikir. Çimkî çavên wî wek du xarên zindoqî dilîstin. Cirmê ew bi zincîrê rapêçabû. Ketibû taya ku wê çawa sed wereqe bida heqê cirma xwe. Miho jî tiliya xwe a girdikê û nîşanê bi hev re xistibûn devê xwe û nenûk dikoja. Vî nizanîbû wek ev ê din fen bikira.
Zibêr bi dengekî lerzok got:
»Baş e ser çavan, ez ê cirma xwe bidim,«
Hemo ji Miho re, »Ma tu?«
»Hûn kengî bixwazin ez ê cirma xwe bidim...«

Hûto ji nişkê ve keniya û pêrgî wî rabû. Mirzo bû ev.
Heso:
»Wey ser herdu çavan teyrê xerîb, şahê mitirban, gula xortan; kuro bi Xwedê min bêriya te kiribû lo. Eger tu niha ne hataiba, min ê qasidek bişanda dû te...«
Ji bilî Heso, heta bi Mele Salar jî ji ber Mîrzoyê mitirb rabû. Mîrzo di sênga odê de rûnişt. Ribaba xwe a wek şûrekî danî ber xwe û peyivî:
»Niha berî temamê xêr û gunehan, pêşî tu bi xêrhatî, axayê min.«
Keniya û çavên xwe li ser civatê gerandin. »Oooh em dereng mane bavo, temamê şeytan, pêxember, melayiket û horiyên nêr li vir civiyane û hayê min jê çênebûye! Ma ka horiya mê çima ne li vir e?«
Heso ji qazî ve:
»Kuro, kîjan horiya mê?«
»Erê lo pîra Sarê ka li ku ye? Bihuşt di bin lingên wê de ye, çênabe ku
222

em lingên wê tewaf nekin. Îsrafîlê sûra haşer û mahşerê Hûto, here bang pîrê bike!«
Hûto bi haweyê ku ma tu çi dibêjî? li Sêdiq nerî.
Mîrzo:
»Kuro hewcenake tu destûrê ji Sêdiq bixwazî, ez û tu û wî û xalê te ê mele em dizê qulekê ne, kuro de zû here ku pîrê goşt bide te, weh!« Hûto çû.
»Apê Heso rewşa zindanê çawa bû? Mar û mişk û dûpişk û mexlûq di çi rewşê de bûn? Êrîşî te ne kirin gelo?«
»Çawa ne kirin, lo! Kurkê min kirin serad û dev jê berdan. Îcar baş bû ku me şeva xwe li mala Şaqûlo derbas kir, yana bi telaq wê wan ez bixwarama.«

»Ê mala Xwedayê te ê mezin ava ku tu bi saxî bi ser me de şand!«
Hûto ji aliyekî de him ruyê xwe tirş dikir û him jî dikeniya.
»Xalê mitirb, pîrê silavan li te dike, lê nayê civatê.«
»Bihata jê re baş bû, me ê li ribabê xista belkî îmana wê hinekî kamil bûba. Di ber ribabê re selewat hîn xweştir dihatin kişandin. Ma ne wilo ye xalê mele?«
»Ma çawa ne wilo ye, li bihuştê jî ribab heye.«
Mîrzo:
»Ha apê Heso berî ku ez ji bîr bikim, lawê min ê piçûk du, sê roj e nexweş e. Ma tu ji dêvla wî jî naçî ser textor?«
Civat keniya. Kenê Selîm dîsa bala Heso kişand.
»Kuro Selîm, hinekî bi hêdî hêdî, tu wek çêlekê diorî!..«
Dema ku zarokên Temo nexweş diketin, Heso bi haweyê doktorkî zarok vedinirxandin û ji dêvila wan ve ew diçû ser doktor. Ji doktor re mîna ku zarokan jê re gotibû, digot. Doktor jî ew bi haweyê ku wî digot vedinirxand û li gora wê derman jê re dinivîsand. Carekê kwînêrek di çîmê Sarê de tê û Heso jî ji dêvila wê ve diçe Mêrdînê nig doktor. Doktor dixwaze wî venirxîne. Ew qebûl nake û dibêje, »Textor beg, kwînêr tam di hindurê xeleka qûna min de hatiye, ez nahêlim ku tu lê binerî, şerm e weh!« Doktor ji ser a xwe danakeve û Heso bêderman ji Mêrdînê vedigere gund. Sarê di civatê de henekê xwe pê dikir û digot, »Hema bila textor li qûna te bineriya, qûna te ne ji wê qûna ku mirov ji ber fedî bikira; ma tu her tim li a min nanere pîro!«
»Keçê ne ku min ji ber fedî kiribû, gava mêrik lê bineriya wê derewa me derketa. Ma kwînêr di min de hebû weh! ... îcar em ji ser a xwe ne hatin

xwar û derewa me ji me re ma...«
Mîrzo mirovekî aştîxwaz û welatperwer, şahirekî gundî û bi qasî xwe jî zana bû. Gelek şihrên Melayê Cizîrî û Feqê Teyran ezber kiribûn. Bi xwendin û nivîsandinê jî dizanîbû. Li vî gundî çêbûbû û mezin bûbû. Bavê wî jî dengbêjekî hêja bû, lê ne bi qasî lawê xwe. Herdu bendan, heta temamê herêmê jî jê hez dikir. Temenê wî li dor çilî bû. Mirovekî bi qasî tayikekî dirêj û esmerekî xwînşêrînî bû.
Mîrzo bi wê rewşa Heso û Circîs a ku li Sitilîlê ketibûnê, agahdar bûbû. Dizanîbû ku wê Heso pevçûnê derxîne. Ji bo ku wî hinekî bi wî dengê xwe ê xweş bisuhurîne, hemû xwe ji bîr bikin û şer dernekeve, bi ribaba xwe hatibû odê. Ji ber vê yekê, Mîrzo bêî ku têkeve sohbetê û destûrê ji Heso bixwaze, rahişt ribaba xwe, ji xwe herkes heyranê wî bû, û govend-kî daniyê:
»Gulçînê ha Gulçînê, wan memkan bi vir de bînê
Kezeb ji agirê hêtûnê, te dil kir gola xwînê
Nazikê nazenînê, te ez xistim nav livînê
Gulçînê ha Gulçînê, ka em herin Nisêbînê
Ha ha ha... rabin rabin...«
Barînî bi Hûto ket, melê da ber û bi milan rahiştin hev. Kenêr rabû, Selîm ket destê wî. Zibêr qîr da, Miho hilda xwe; Temo bi Sadiq re rabû û hev girtin. Bi sêngê çûnê û kişiyan hewşê.
»Rû helawa Mêrdînê, lêv liqûm hingivînê
Meşiya, hejiya xwe berda, dil di xwînê de werda
Gulçînê awir veda, dîn bûm min aqil berda
Gulçînê ha Gulçînê, ka em herin Nisêbînê
Were were were... bi milan bi milan...«
Hemo ji ber lingên xwe ên ku di felaqê de teqiyabûn, nikarîbû têketa govendê. Li ser dika hewşê li ser kursî rûnişt û bi kêf li wan temaşe kir.

Heso qîr da:
»Lawo ma qey ez kafir im ku hûn kursiyekî ji min re jî nayînin!«
Gava wî bang kir, Meyro bi rê de bû. Heso di devê deriyê odê de li ser
224

kursî rûnişt û melûl melûl li wan nerî.
»Çavên wê ên xezalan, diran mîna mircanan
Memik ji rengê hinaran, sêng wek berfa zozanan
Gulçîn ava zinaran, fincana dest siltanan
Gulçînê ha Gulçînê, ka em herin Nisêbînê
Ooof of!.. agir pê deyne agir agir!..«
Hûto:
»Meyro zû gazî Hitê bike! Of of!..«
Sarê:
»Kuro min xwelî li serê te kiro, jinik li ber dewêr e, ma te xwe ji bîr kir, hi!«
Sadiq:
»Meyro têkeve destê Hûto!«
»Erê keko, erê.«
Sarê:
»Keçê çawa erê! Zaroka te di dergûşê de digirî!«
Meyro dergûş li ber devê deriyê malê danî û bi bazdan ket destê Hûto.«
Sadiq:
»Hûto, Meyro ji hertiştî re 'erê' dibêje. Binere tu tiştekî ku wê destlimê-ja mirov xerab bike, ji xweha min re nebêjî, ha! Tu fêm dikî, bê ez çi dibêjim?«
»Oh tu jî xalo, ew dikeve destê min, îcar a min çi ye! Ez tiştekî ji destlimêjê fêm nakim...«

»Kuro yanî tu qurîncekan filan jê nedî, dibêjim...«
»Xalo ji wê re bibêje, bila ew ji min qurîncekan nede.«
»Ma qey qurîncekan ji te dide, hi?«
»Heta niha nedaye.«
»Zulf kişiyane ser rû, mîna kevanan ebrû
Li ber bayê seherê, bêhn dide wek emberê
Gulçîn veke kemberê, te dil da ber xencerê
Gulçînê ha Gulçînê, ka em herin Nisêbînê
225
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Haho haho!..«
Heso bang kir:
»Keçê Sarê zû ji dêvla min û xwe têkeve govendê!«
Sarê şahra xwe girêdida û xwe ji reqsê re hazir dikir. Wê dengê wî ne kir.
»Rê ji pîra xwe re vekin ez hatim! Ji bilî Hûto, ê ku bikaribe bi min re derxe serî, bila li xwe biqewimîne.«
Hemiyan dixwest ku pîrê têkeve destê wî. Pîrê govend xweş radikir. Zibêr jêhatî bû, lê mele jî jêhatî bû. Kesî nikarîbû bida ber Hûto. Di eslê xwe de hemû jî reqisvanên di ser xwe re bûn. Sarê ket destê melê. Xortaniya Heso hat bîrê. Bêhemdî xwe hêsir barandin. Di dawiyê de xwe li ser kursiyê ne girt, bi çarlepikan çû ser cihê xwe. Lihêf kişand serê xwe, devê xwe xist balîfê û wek zarokan giriya...
Reşo ji Nisêbînê dihat. Çenteyê xwe ê dibistanê danî ber dergûşa Nêrgizê û bi lez ket destê dapîra xwe. Piştî ku Reşo ket destê wê, Sarê lîland û tam lê germ bû. Govend li hewşê geriya. Mîrzo gazî jina xwe kiribû. Jina wî hatibû û ketibû govendê. Wekî din jina Sadiq Xanê, jina Selîm Behiya, jina Hemo Zînê, jina Miho Rewşê û jina Zibêr Fatimê di-

reqisîn. Qîz û xortên pizûriyan bi carekê ve hatibûn. Xort û qîzan li aliyekî û jin û mêran li aliyekî govend gerandin. Hûriyan jî ji ser xaniyên xwe li wan temaşe dikirin.
Mîrzo bangî wan kir:
»Bêhna xwe fireh bikin, bi êvarkî re jî em ê li ba we govendê li dar xînin...«
***
Saet li dor yekê şevê ye. Şev wek teniyê reş e. Deriyê odê girtiye lê ne xiliqandiye. Fitîla lempê hatiye daxistin, ji der ve de hindur reş xuya dike. Heso li ser cihê xwe serpiştkî paldayî ye û li hewşê guhdar dike.
Derî bi dizî vebû, derî bajarkî hatibû çêkirin, ji ber vê yekê deng ji derî ne hat. Reşekî xuya kir û bi lez û bez derbasî hindur bû, xwe da ber dîwêr, tiştek danî erdê û bêdeng li ser lingan sekinî. Deqîqeyek ne ket wê navê, reşekî din bi haweyê ê pêşî derbasî hindur bû û wî jî pala xwe da dîwêr. Heso bi dizî got:
»Hertişt temam e!«
Herduyan bi hev re »erê« gotin.
»Ma malî bi hatina we ne hisiyan?«
226

»Na, kesek bi me ne hisiya.«
»Binere nebî nebî, hûn hîç bi navê hev bangî hev nekin!«
»Em ê bangî hev nekin.«
»Binere hûn têxin bin dîwarên êxur ha!«
»Erê.«
»Ku we karê xwe qedand heryek bi aliyekî de herin û bi dizî xwe bigi-hînin malê!«
»Temam.«

»Binere eman eman, kes bi vê meseleyê nehise! Bi tenê em hersî pê dizanin. Bi devê xwe karibin û tiştekî ji kesî re nebêjin. De herin Xwedê bi we re be.«
Kenêr û Simo wek du guran dan ber hev û ji hindur derketin. Gihan hindama mizgeftê kûçik ji binya mala Circîs reyan. Wan xwe da ber dîwarê mizgeftê, xwe bi dîwêr re kirin yek û pê bi pê bi jêr de meşiyan. Navbera mizgeftê û mala Circîs li dor sih metroyî bû. Lê van hîn dîwar xelas ne kiribû du kûçikan bi hev re êrîşî ser wan kir. Kenêr bi lez xwe şil-fîtazî kir, pişta xwe da kûçikan û xwe daqûl kir. Kûçik sekinîn û ew bi wî haweyî ber bi wan de çû. Ew çiqasî çûn, kûçik jî bere baş bûn. Di dawiyê de kûçikan kire nûze nûz û reviyan.
Heso bi dû wan de radeka derî kişand. Hat ser cihê xwe, destê xwe dirêjî lihêfê kir, lê bi ser xwe danekir. Mîza wî dihat. Bi qûnkişkê xwe gi-hand serşokê, mîzt, lê av bi dû mîza xwe de ne rijand.
Simo di qorziya dîwarê êxur de kîsikê xwe vala kir. Kadîn di navbera qesirê û êxur de bû. Simo rahişt xilç, serê xilç li kevir ket, çingînî jê hat.
»Hêdî kuro!« Kenêr got û bi herdu destan ew hişk zeft kir.
»Bisekine, dengek ji êxur tê!«
Hesûk pez êm dikir. Piştî bêhnekê deng nema hat, wan dîsa dest bi karê xwe kir.
Simo xilç li erdê xist, xilç tiliyekê ne çû xwar li tahtê sekinî. Wî pênc caran cih guhert û di herpênc caran de jî xilçê wî li tahtê sekinî. Dîwarên êxur bi kevirên kufarî û hişkeberê hatibûn lêkirin. Kevir mezin bûn. Baranê heriya di navbera qelşên keviran de hilandibû. Gelek qelş hebûn ku deremêt bi rehetî tê de bi cih dibûn. Simo du deremêt di bin qorziya dîwarê roave de çep û rast bi cih kirin. Destên wî diricifîn. Bêvila wî jî di-herikî. Kêleka xwe a çepê pir dixurand. Herdu deremêt jî xweşik bi cih ne bûn. Rahişt xilçê xwe û sê deremêtên ku mabûn û di dîwêr de li qulan

geriya. Qul ne dîtin. Dîsa çû û hat û xilçê xwe di erdê de bir. Hema bi asas

ve du deremêtên din jî bi cih kirin. Ji van herduyan yek jê cihê xwe tam girtibû. Fitîl jî hemû ne li sêrekê jê kiribûn. Fitîlên deremêtên ku di qorziya êxur de bûn, bi qasî du metroyan dirêj bûn. A bi dû van de kintir, a din ji vêna kintir û a dawî jî ji hemiyan kintir bû.

Simo:

»Hê hê!«

»Çi ye!«

»Ez ê vê deremêtê jî têxim bin qesirê.«

Kenêr bi ser de hilbû:

»Na na!..«

»Hişş dengê xwe neke, ez ê têxim bin ewqas!«

Wî bi a xwe kir. Qesir du tebaqe bû. Tebaqa jêrê bêşibake bûn. Ji dêvla şibakan di jora dîwaran de bi tenê çar qulên ku li ser bihustekê fireh û girover hebûn. Simo tibabê deh deqîqeyan ji aliyê rohilat de li ber dîwarê qesirê xebitî. Di vir de jî deremêt bi cih kir. Vê carê baş bi cih kir.

»Hertişt temam e.«

»Pêşî ji aliyê kadînê de biteqîne!«

Simo meşiya, Kenêr bêî ku ew pê bihise, deremêta di ber dîwarê qesirê de kişand, xist bin çengê xwe ê çepê û ji qesirê bi dûr ket. Simo li ber qorziya êxur çong berdan erdê û di bin çakêtê xwe de çixare pêxist. Êgir hîç xuya ne kir. Ev haweyê wî ew dida dest ku bê çiqasî diz bû. Çakêt kişand ser serê xwe, bi herdu fitîlan girt. Serikên fitîlan bi tiliya xwe kola. Barûda fitîlekê bi qasî movikekê rijiyabû. Ew bi herdu destan lê xebitî, lêbelê fitîl neçiriya. Pense hat bîrê. Wek dînan li dêrûdora xwe nerî û dest

pelikandin. Pense li ser kîsik bû. Dît. Bi lez fitîl qut kir, pense danî erdê û serikê herdu fitîlan di ber hev re radan. Çixare danî ser wan û hilma xwe kişand. Agir pêket û bi ser ruyê wî de pijiqî. Simbêl û mijank kizirîn, rû û lêv şewitîn. Kenêr li ber dîwarê mizgeftê li ser lingan sekinîbû, pişta xwe dabû dîwêr û dimîzt. Cilên xwe li xwe kiribûn. Simo li ber deremêta sisêyan teniştkî pal da û çixare bi fitîlê ve zeliqand. Agir pêneket. Deremêt ji cihê wê kişand; bi haweyê ku berî niha kiribû fitîl di bin çakêt de pêxist. Fitîl mîna zîzokê zîvirî û hawêrdor agir pijiqand. Wî deremêt avêt wê navê û bi bazdan çû a çaran. Xwe qulûz kir. Hesûk hilkişiyabû ser xaniyê malê û li nav erdê mayinan temaşe dikir. Xaniyê malê bi ser kadînê vebû. Du deremêt teqiya bûn.
»Eeehew lawo, bê çawa mayin diteqin! Ji sedî sed ew antîtenq mayin in...«
228

Simo dengê wî kir, di ber xwe de keniya. Ji bêaqiliya wî cesaret girt, xwe gihand deremêta çaran û agir bi wê ve jî danî. Bi bazdan çû bi a bin dîwarê qesirê ve. Li gor wî deremêta çaran jî teqiya bû. Lê ne çar, sisê teqiya bûn.
»Eeeehew lawo ev çawa mayînin! Ji wir û heta bi vir erd diheje! Batil batil! Bi Xwedê niha kes sax ne filitî ye!«
Hesûk eger hema serê xwe bifitilanda, belkî tiştek fêm kiriba. Agirê ku ji fitîlan diçû, pişt xaniyan bi carekê ve ronî kiribûn; heta pêşiya wî bi xwe jî bûbû ronahî.
Simo kîsik û pensê xwe li wir ji bîra kirin û ber bi berqefan de bazda. Kenêr jî bi jora gund de bazda. Kesî ew ne dîtin. Deh deqîqe ne ketin wê navê, melê li tenekê xist û li navtarên gund çû û hat. Bi lêdana teneka wî, temamê gundiyan ji xewê şiyar bûn.

Heso serê xwe xistibû bin lihêfê. Ji aliyekî de ji tirsa ku wê sibehê ev bûyer çawa encam bida lêva xwe dicût û ji aliykî jî de dikire xire xir. Dizanîbû ku wê bêhneke din Sarê bihata odê. Sarê ew di xew de bidîta ji bo wî baştir dibû. Wilo difikirî.
Sarê li derî xist û bang kir:
»Pîro pîro, zû derî veke!..«
Wê çiqasî li derî xist û bang kir, Heso jî ewqasî kire xire xir.
»Lawo Temo derî bişikîne. Sê, çar şeve ku bavê te ranezaye xew lê giran bûye...«
Heso jî ji xwe ev gotin dixwest. Di bin simbêlan re dibeşişî û henekê xwe bi aqilê Sarê dikir. Temo xwe da derî û hilqerast. Piştekên radeka hesinî ji ber bûn, derî vebû. Sarê pêşî fitîla lempê hilda. Lihêf ji ser Heso avêt û milê wî hejand:
»Kuro hey agir bi malê keto, rabe ji temara mirinê!..«
Heso mîna ku bi rastî xew lê giran bûbû, »Çi ye lê! Te çima ez şiyar kir-im Xwedê jê raziyê!« got û çavên xwe firkandin.
»Te porê min kur kiro, qaçaxçiyan dîsa li hidûd xistin!«
»Na lê!«
Heso di bin tesîra gotina wê de, bûyera ku wî bi xwe dabû erêkirin ji bîr kir û şaşomaşî axivî:
»Qaçaxçî, qaçaxçî ha! Tu bi rastî dibêjî? Kengî kengî?..«
»Hema berî niha bi çend kêlîkan. Ma dengê teneka melê nayê te?«
»Ma teqîn çêbû? Eskeran dan dû wan? Şintaq pêket? Terempêl xuya dikin? Ma gihan bestê an na? Lempê hûr bikin! Temo derkeve ser xênî û

li ser rêyan temaşe bike!«

Temo bêî ku lempê hûr bike hilkişiya ser xênî.
Sarê:
»Sê, çar mayin teqiyan. Ê ne te nedît bê çawa erd dihejiya!..«
Bi vê gotinê şiyar bû.
»Ma tenê dere, e erê lê erê erê, ma tenê mayin teqiyan? We pêjina tiştekî din jî ne kir?«
Kela girî kete qirika wê:
»Ma ji mayinê mezintir wê pêjina çi hebe Heso? Mayin bi rebenan de teqiya, ew perçe perçe kirin! Kî dizane bê niha çend kes ji wan hatine kuştin, howeh li min porkurê! Jinên wan ên ciwan, zarokên wan ên hûr û mûr hemû wê di nav lingan de telef bibin û herin! Nizanim bê çima vî guyî dixwin, erê niha we çi ji xwe fêm kir! Mal çû, can çû, jin ji xelkê re man, zarok man li ber dîwaran. Ji xwe re şivan û gavantiyê, hemaliyê bikin û vê quzelqurta ha nekin, hey bêmirad çûno! Wey li min rebenê, diyên wan wê çawa bikaribin vê êşê tahmûl bikin! Wê ew zarok çawa bêbav mezin bibin!..«
Sarê zû bi zû ne digiriya, vê kêlîkê giriya û wek baranê hêsir barandin. Sarê lempa dilê wî bû û ji qahremaniya wê cesaret digirt. Heso tu carî nikarîbû xwe li ber vî girî bigirta.
»Keçê ev çi girî ye! Tu çima li ser min nagirî diya minê; Circîsê te îro çend roj in ez behdilandim, mala min şewitand. Ez li ba te û mêrê te me, tu li ser min nagirî, Licê li terefê dinyayê ye, tu liciyan nas nakî û tu li ser liciyan digirî...«
Sarê giriyê xwe qut ne kir, lê bersiv jî neda. Heso li hev xircilî, dilê wî sivik lê xist û di cihê xwe de qeliqî. Mejiyê wî di bin tesîra giriyê Sarê de sawêr girt; niqrîsk hatênê û tevzînok bi laşê wî ve hilkişiyan. Deremêtên ku li ser gotina wî di bin xaniyê Circîs de teqiya bûn, mîna ku bi rastî bûbin mayin û bi liciyan de teqiyabin, lerizî. Di dawiyê de xwe ne girt,

bang kir:
»Temo Temo, ma çawa bû? Pêjina qaçaxçî û eskeran tê an?..«
Temo hat odê.
»Yabo, min pêjina tu tiştî ne kir. Her der bêdeng e...«
Sarê hîn digiriya. Giriyê wê dilê wî dax dida. Tam di vê bêhnikê de Heso ji ser xwe çû û bi carekê ve belav bû.
»Na na, here ser xênî, here here!..«
Temo ji odê bêdeng derket. Ew hîn ne gihabû ser xênî, Heso bang kir:
230

»Ma hatin? Erê kuro esker hatin! Esker esker!..«
Wî çiqasî bang kir, Sarê jî ewqasî zor da girî. Di eslê xwe de Sarê ne ku li ser qaçaxçiyan digiriya. Kuştina Cibran û Dawidê Osmên dihat ber çavên wê. Li ser kuştiyên xwe digiriya. Cindiyê Serhên wek Dawid xortekî sipehî û jîr bû. Cindî jî bi dû docê vekiribûn û di nav pirêzên gund de doc ajotibûn. Laşê wî hemû xerab bûbû. Qîr û hewar hewarên Cindî di guhên wê de zingînî dida.
»Li min porkurê, niha gelek ji wan birîndar ketine û nali nalên wan e. Sibehê wê wan jî bi dû terempêlan ve girêdin û bikişkişînin!..«
Heso ji bo ku bi xwe şiyar bibe, ji desthilanîn nekeve û li xwe mikur neyê, qurîncek ji xwe didan. Rîha xwe dikişand û dev lêva xwe dikir. Lê hîç jî fêde ne dikir. Xwîn lê vemirî bû, mîna quşûfê zer vedabû.
»Lo lo Temo, ma qaçaxçî gihan ku derê? Zû tiştekî bibêje!«
Tiştek tune bû ku heta Temo jî tiştek bigota. Temo dîsa hat odê.
»Yabo, wilehilezîm ji girgira ewran pê ve dengê tu tiştî nayê...«
Sarê neperûşk ji ruyê xwe dan û bi haweyê ku termên neh, deh kesan li ber bin kaliya:
»Di vê seqema dijwar de û hemû wilo birîndar, haho haho! Niha

birînên wan wek çaviyên kaniyan vebûne û ha ha xwînê dibeliqînin!«
Qêrîn bi Heso ket:
»Eeehew eskeran em hilanîn!« got û dev lihêfê kir.
»Kuro lawê kerê, here binere bê gihan ku!«
Temo piştî ku ziq li herduyan nerî û hinekî hizirî, destê xwe di ber xwe re hejand, »Belkî jî eskeran dora gund zeft kiriye, ez nabînim« got û bi bazdan çû.
»Îcar gelo ew teresên eskeran sibehê wê çi bikin ji me? Wê çend kesan ji me bikujin? Û ku bi birîndarî têkevin destên wan, wê ew birîndar li ser me çi nebêjin! Wey li min pepûkê!..«
Heso dîsa qêriya:
»Keçê de re mêêê t!..«
Sarê gotina »deremêt« bi haweyê ku »de rabe biceheme ji vir!« fêm kir. Rabû ser xwe û hinekî sekinî. Bêvila xwe bi hûçikê kirês paqij kir. Hûçik berdayî bûn. Servekirî hatibû odê. Derpiyê wê sor bû, lê reş xuya dikir. Lastîka delingê wê ê rastê filitîbû, devê deling mîna şalê botiyan fireh vebûbû û lingê wê nixumandibû. Kirasê wê ê şîrikî rengê xwe ne dida. Xwas bû. Li ser çementoyê şopa lingên wê xuya dikirin. Dengê xwe ne kir û ji odê derket.
231
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Lawo Temo hey agir bi malê keto, ma tu çima dengê xwe nakî looo! Te çi fêm kirrr! Li aliyê mala Circîs binere, Circîs Circîsss!..«
Deng ji Temo ne hat.
»Lawê berêz, bersiva min bide!«
Temo bi lez daket.
»Yabo, wilehî û bilehî pêjina tiştekî nayê. Ji qereqolê ronahî xuya nake.

Ne ji bestê û ne jî ji tu derên din dengê qaçaxçiyan tê. Deng ji mala Circîs jî nayê.«
Ji kûraya kezebê keserek veda û rîha xwe firkand.
»Ka here binere bê hîn jî diya te digirî, an na...«
Temo di destê wî de wek zarokekî bû. Çû û zû jî vegeriya:
»Yabo, bi Xwedê îske îska pîrê bû. Ev îşev çi bi pîrê hatiye, min di temamê emirê xwe de ne dîtiye ku wek îşev giriyaye. Xwedê xêr bike.«
»Na na, bila negirî. Ez ê ji te re bibêjim û tu jî here jê re bibêje.«
»Wileh ku tu bikaribî wê haş bikî, baş e. De ka bibêje bê tu ê çi bibêjî?«
Heso xwe cidî kir, lê bi heyecan jî got:
»Erê lo, yanî min got bila negirî tştek ne qewimiye. De ka dîsa pêşî here ser xênî li qereqolê û mala Circîs binere û dûv re jî here wê haş bike.«
Temo bi şerwal û tena qutik bû. Ber xwe ne xiliqandibû. Qutik dabû ser hev û xistibû bin şerwêl. Ji serma dirikrikî. Şimik di lingan de bû. Bêgore bû. Bi çûna wî re Heso ponijî:
»Ez divê bibêjim. Gotina min ji ne gotinê çêtir e. Eger ez Sarê bi xwe nehisînim, dibe ku ev mesele hîn ne baştir bigere. Dibe ku ez ji herkesî re bibêjim. Û wî çaxî jî wê herkes min neheq bike. Ma mirov deremêtê dixe bin xênî! Lewra dijminê mirov çiqasî bênamûs be jî, mirov vê yeka ha tê de nake. Erê mirov tê de dike; gava ku dijminê mirov yekî wek Circîs be mirov ne deremêtê, mayinê mayinê dixe bin xênî. Na, ez li xwe mikur nayêm...«
Temo bêhnçikyayî xwe avêt hindurê odê:
»Yabo, li tara jêr kûçik direyên; hin kûçik jî dizûrin!«
»Na lo! Zû xwe bigihîne ser xênî û li qesira Circîs binere! Ma diya te hîn jî digiriya?«
»Erê erê,« got û dîsa bi lez derket .
Heso tam ji ser xwe çû.

»Sarê bi derewan nagirî, rast e mayin teqiyan e. Na na deremêt bûn. Min çima ev tişt qebûl kir? Ev çawa ûjdan e, mirov çawa dikare wilo bi-fikire! Hemû sûcê Simo bû. Wî ez ji rê birim. Kenêr bi aqil bû, gerek wî
232

rê nedaba vê yeka ha. Min bi a wan kir. Of bêhna min dernakeve. Ez ê bibêjim. Wey ma ne min ji wan re gotibû ku deremêtan têxin bin dîwarên êxur!« Kêfa xwe anî û keniya. Lê di kenê wî de kêfê hîç xuya ne dikir; kenekî derwêşî û melûl bû. Zû jî qut kir.
»Ferqa êxur û xaniyê malê çi ye yanî? Çawa ne çi ye? Yek cihê insên yek jî cihê heywên e. Ez xênî dihedimînim, hin xaniyên wan ên din jî dikarin bi êxur re bihedimin. Di axur de şivanê wan radiket. Belkî hin zaroyên wî jî li wir raketî bin. Hema zaroyên wî ne hatibin kuştin, şivan be dîsa xem nake. Em ê çend qurûşan heqê xwîna wî bidin û wê mesele bê girtin. Erê çima min çewtiyeke wilo kotî kir? Dijminê heywên dijminê insên e jî. Insanê ku heywên bikuje dikare insên jî bikuje. Min ew hemû kuştin. Ax ku bi rastî hemû hatibana kuştin û tiştek bi kesekî ji me nehata, bê çiqasî baş bû! Hemû nayên kuştin, min mala xwe şewitand! Ev niha ez bi xwe dizanim bê ez çi dibêjim? Gelo ez li ser hişê xwe me? Ha ma ne wê deremêt ne xistibana bin qesirê. Tew tew, ku dibêje min ji wan re gotibû wilo û wilo bikin. Herdu jî kafir lawê kafiran e, bi telaq xistine bin qesirê û temamê xaniyên wî!..«
Temo serê xwe di derî re dirêjî hindur kir, bi ecele:
»Yabo kûçik êrîşî hinan dikin« got û bi mêrdewanê ve hilkişiya.
»Niha tu bi qedirê Xwedê kî tu rast dibêjî, lo! Ma qesira wî hedimî ye, qesir qesir!..«
Temo bi rastî jî mirovekî tam saf bû. Di nav pez û dewaran de mezin bûbû, ji şiklê reyandina kûçikan yekser fêm dikir. Gava kûçikan pêjina

gur dikir, kûçikên qels dizûriyan û ên xurt jî bi him û gim xwe li erdê dix-istin, bi dengekî qalind û tena tena direyan. Doguj bi neh, deh kûçikan ve li qelaçê aliyê Dêrê gur zeft kiribû. Qelaç bi gund ve bû. Hin kûçik jî li navtaran dûzûriyan û dikirin kûze kûz. Û Temo jî hîn mesele fêm ne kiribû.

»Temam, îcar ez ê li xwe mikur bêm. Min xanî bi ser temamê kuflet de herifand, hertiştê me derket meydanê. Navbera me û qereqolê du sed metro ya heye ya tune ye. Qomandar dengê deremêt û mayinê ji hev nas dikin. Ev karê wan e. Esker bi hewara Circîs ve hatine. Kûçik êrîşê dibin eskeran. Sarê Sarê, keçê de ka wer ku ez hemî ji te re bibêjim! Were binere

bê me çi gû xwariye!..«

Temo dîsa ji devê derî bang kir:

»Yabo, li ser rêya Dêrê kûçik rikêbî ser insên dikin. Dengê Circîs ji binya gund tê, lê ez fêm nakim bê çi dibêje« got û dîsa hilkişiya ser xênî.

233

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Heso qêriya û qêriya:

»Keçê Sarê, ka were! Me mal bi ser birayê te û kufletê wî de xirîxopan kir! Keçê de were !..«

Doguj û gur hevdu girtibûn û li hev dixistin. Dengekî cêhilî jî di nav dengê reyandina kûçikan de bilind dibû. Dipeyivî û bi kûçikan re li gur dixist. Gur ji jêra gund ve hatibûn û xwe dadabûn hewşa Etman. Circîs bi teqîna deremêtan rabûbû ser xwe, çavdêrî li ser rêyan dikir. Bi guran hisiya bû. Di şibaka qesirê de rûniştibû û navtêdan di wan de dida:

»Hema tu kî be, eferim ji te re! Ez di temamê heyata xwe de îşev dibîn-im ku insanek û gur li hev dixin. Ma ez bêm bi hewara te ve lo!..«

Bi teneka melê re gundî şiyar bûbûn. Di nav bêdengiyê de herkes tevdigeriya. Lê kesî jî xwe ji mal bernedida. Gelek ji wan mîna Sarê, ji tirsa ku wê sibehê çi afat bi serê wan de bihata, digiriyan.
»Temo Temo, lawo diya te nayê vir, îcar were ez ê ji te re bibêjim!..«
Deng ji kûçikan nema hat, ber bi gund de xwe berdan. Temo di nav kûçikan de reşê wî dengê ku wek dengê tabûreke esker bihîstibû, fesiland. Lê nas ne kir. Heso zor da Temo.
»Kuro bêşerefo, ez bangî te dikim, tu çima nayê!..«
Temo hat û li himber wî li ser pêyan sekinî. Derî vekirî hişt.
»Rûne ku ez ji te re bibêjim!« Rûnişt û guh da ser.
»Kenêr û Simo deremêt xistin bin xaniyê Circîs. Ma gelek ji wan hatine kuştin? Eskerên ku hatine gelek in?«
Temo behetî.
»Tu çi dibêjî yabo!«
Pêjin ji hewşê hat. Temo bêhemdî xwe hilqevizî û çik sekinî. Heso jî çeng bû, pişta wî li dîwêr ket. Reşo bû ev.
»Kalo ê ne tu nizanî bê min û Doguj me çi zir gur kuşt, gur!«
Devê Temo berî dilê wî bi xwe şiyar bû. Lêv ji ser hev çûn, beşişî. Lê hîn jî nikarîbû xwe bilebitanda. Ji qiram ketibû. Heso wek kewê ku di dahfkan keve, gewdê wî bi carekê ve melisî, serê wî jî hildayî bû û qîq li Reşo dinerî. Hersê jî bêhnekê ne peyivîn. Piştî ku Heso got »Çi çi çii!« pala xwe da dîwêr û li Temo nerî.
»Me gur kuşt gur. Termê wî li ba golê ye, hûn ê sibehê bibînin. Doguj devê xwe xistibû qirika wî û min jî bi pehînan lê dixist. Di wê bêhnikê de min çiqasî dixwest ku Hûto li wir ba. Ê ne kalo, te nedît bê pevçûna wan çiqasî xweş bû. Ew jî ne kêmî Doguj bû yanî. Eger ew û Doguj bi tenê bana, belkî Doguj nikarîba pê. Kûçikên din jî alî me kirin. Gur gelek
234

bûn. Lê min heta bi çaran dîtin. Hevalê xwe di nav lepên me de hiştin û reviyan.
»Ev tu çi dibêjî, ez fêm nakim?«
»Kalo, qey tu ji min yeqîn nakî? Ji bavê min re bibêje bila bê, ez ê wî bibim ser bereta gur.«
»Yanî niha ev qolordiya ku dora gund zeft kiribû, hemû tu bû ha!«
Reşo keniya.
»Hiii, tu behsa mayinan dikî? Ew ne mayîn bûn, kalo. Li nav gund diteqiyan.«
Heso veciniqî.
»Tu çawa dizanî kuro?«
»Ez li mala mahelim bûm. Mahelim araq vedixwar. Ez û jina wî em di-reqisîn û wî jî ji me re li tembûrê dixist. Piştî ku xalê mele li tenekê xist, ew jî hat wir. Erol ji wî re jî got. Kalo kî bûn ew ên ku deremêt teqandin?«
»Xwedê ne hişt, ev çi gotine! Deremêtên çi! Kê ji te re got?«
»Erol got.«
Heso li Temo nerî, çavê xwe girt û devê xwe vekir:
»Bêşeref yaya gidî bêşeref, tu jî zilam î ha!« Tif nav şeqên xwe kir, »Wey tifî li vî kîrî be ku tu jê yî! Lawê wî zarokeke dide dû guran, ew jî zir ni-hîtekî zilama ye ji desthilanîn dikeve û vî gundî tije esker dike. Ji teyrên ku te li min û diya xwe çêkirin hindik mabû dilê me biqetiya. Sed sal e ku tu xwedî kûçik e. Tu li ber pez û di nav gur û kûçikan de mezin bû. Kûçik gava bêhna gur dikir, çawa direya te nizanîbû, hi! Tu çawa dengê Doguj nas nakî! Ma wê çawa nas bike yabo, mêrik li jina xwe hatiye. Îcar zilamê ku li jina xwe bê, tu ê hêviya çi jê bikî! Zû ji ber çavên min winda bibe, kûçik lawê berêz!«
Kipînî ne ket Temo; pir li ber xwe ket! Heso erza wî li himber lawê wî

şikenandibû. Serê xwe berdabû ber xwe û diponijî. Ji odê derket.
»Lawê min Reşo, ma Erol wekî din çi digot?«
»Kalo bêhna xwe pir teng kiribû. ‘Gundî deremêtan di bin xaniyên hev de diteqînin. Ev tiştekî pir talûke ye!’ digot«»Ê îcar melê çi digot?«
»Piştî ku Erol mele bi teqîna deremêtan hisand, melê xwe ji Erol bêhn-tengtir kir. ‘Eger wilo here ez ê jî araqê vexwim,’ digot.«
»Lawê min Reşo, mîna ku tu hîç ne çûyî mala Erol efendî, behsa tiştekî neke. Here ji xwe re razê û bavê xwe bişîne vir. Eferim lawê min, tu mêrekî di ser xwe re yî. Pîrika te Sarê bi derewan ji te hez ne kiriye. Bi

telaq tu ê ji pîrê re ne qereqola Sitilîlê û Qesra, Tûgaya Mêrdînê feteh bikî. Qolordî ne himberî te ne, qolordî!«
Reşo ji kêfan re dikir bifiriya. Bapîrê wî ew ji xwe û bavê wî mezintir kiribû. Pesindaniyeke bi vî haweyî ji bo naşiyekî hivdeh salî ne baş bû. Reşo xwe nepixand û meşiya.
»Min çi xwelî li serê xwe kir! Binere hemû deqîqeyek mabû, lawik li hewşê bû, ha. Min xwe hema çend saniyan ragirtiba, lawik diket hindur û Temo jî wê bi vê pîsitiya me ne hisiyaba. Ma hisiya wê bibe çi, yanî. A baş ku pîrê pê nehise...«
Temo li himber wî bi haweyê xulaman li ser kursiyê rûnişt. Yanî qewe-ta gewdê xwe ji ser kursî bêtir berda ser lingan; kelef bi kabokan ragirtin û xwe bi ser hev de pirnisand. Ew qelafetê wî ê girs û vê rewşa ha qet li hev
ne dikir.
»Yabo, te gazî min kiribû.«
»Erê« got û sekinî.

Heso bêî ku bi xwe agahdar bibe bê çi dike, dixwest Temo bipeyive. Zanyariya wî di demên xofgirtin û bêhntengiyê de ji pêşzanyariya wî bêtir di bandora binzanyariyê de çerx dikir. Eger Temo hinekî bi kêrhatî ba, peyvek wî dikarîbû bûba mifta xilqa zindana mejiyê vî. Wê gavê jî problema ku rû dabû, wê ewqasî mezin neba. Ev rêdana Heso bi xwe tiştekî bedew bû. Ji ber ku dixwaze lê guhdar bike, lê ê li himber wî bi qasî zarokekî ku li koşk û serayan rûdinişt, nikarîbû bifikiriya. Di bîstikên xofgirtinê de peyvandina xwe bi xwe ji guhdarkirinê û di bîstikên bêhn-tengiyê de jî guhdarkirin ji peyvandina xwe bi xwe çêtir bû. Heso tam di van kêlîkan de dewreke bêhntengiyê digire û naxwaze bide, dixwaze bistîne. Heta Heso yekî wilo bû, di bîstikên xof girtinê de jî dixwest bistîne; yekî zana pê re rûne û ew jî lê guhdar bike.
»Yabo, ez li te guhdar dikim. Bibêje!«
Heso pêşî keserek veda. Bi haweyê ku alikariyekê jê bixwaze fikirî, piştî ku bêhnekê lê nerî û wî jî serê xwe berda ber xwe, dest bi axavtinê kir:
»Gelo ne baştir e ku mirov biçe derdora xaniyên Circîs saxtî bike bê ka çi bi xaniyan hatiye?«
»Tu dizanî yabo, tu çawa bixwazî ez ê wilo bikim.«
»Hema wilo ha.«
»Erê wilo.«
Tirs, bêhntengî û neçarî bi hev re di hezaza mejiyê Heso de zîvirîbûn; di hêwanê de pêrgî hev hatibûn û mîna sê lezbiyenan hev dialastin. Ev
236

kêlîk pir tehlûke bû. Eger Heso mirovekî alim ba, di vê kêlîkê de dikarîbû xwe intîxar jî bikira. Di çavên wî ên ku li dûr dinerîn, dil dixuya. Dilê wî diniqirand; dil mîna motorê ku hewa dikir û piçpiçî benzîn distend, kurkubî lê dixist. Dihejhijî. Xwêziya wî ne diçû xwar. Temo jî hîç bîr ne

dibir ku fireke av bidayê. Piştî ku ji Temo re got »De ka here« û Temo jî çû, ew dîsa bi xwe re kete mihasebê:
»Min çima ev yeka ha kir? Qaşo ez mirovekî bi hesab bûm. Ez yekî wi-lo bûm ku ji qewimandina meseleyê bêtir, min bala xwe dida ser dawiya meseleyê. Ez firavînê dixwim û li ser firavînê hesabê firavîna roja din dikim. Û min her tim jî bi qeweta vê fikirê qezenc kiriye. Îcar sibehê wê kî ji min re çi û çi nebêje! Hema kî çi dibêje bila bibêje, bi tahtilerd kirî! Te baş kiriye. Ma Circîs ê ku mirov dûnde jê bihêle. Insanên wilo gerek bi carekê ve mehû bibin. Tew, yanî niha ev jî gotin e tu bi qedirê xwedê kî. Lê ne bi hesabê kuştinê, bi hesabê ku wî bitirsînim û wî hinekî ji es-keran dûr bixînim, min ev tişt kir. Hîletê min ji bêbextiyê diçû. Ez li ba bêbextan rûnediniştim. Min bêbextî li Circîs kiriye. Bêbextî jî karê qelsa ye. Ez di çavê xelkê de him bûm bêbext û him jî bûm qelsok. Gelo ne baştir e ku ez hema niha temamê zilamên xwe li odê bicivînim û em êrîşî ser mala Circîs bikin? Bi êrîşê re em ê bi tivingan li xaniyan girêdin û wî çaxî jî wê ev meseleya deremêtan ji holê bikeve, winda bibe. Bila em deh kesan ji wan bikujin û bi deh salan di hepsan de bimînin û bila navê min bi bêbextî dernekeve. Cihê bêbextan di civata gunmezinan de tune ye. Mirovên ji xwefedîkir, ne bêbextiyê dikin û ne jî bi bêbextan re rûdinin. Na ne wilo ye. Wilo ye, lê tu derewan dikî bibêje. Ma ji Zibêr bêbextir kî heye gelo? Ev tiştekî din e. Tu wek Sadiq difikirî. Kîjan baş e gelo? Ez şer derxînim an ez xwe li bendî sibehê bihêlim bê ka mesele çawa dizîvire? Bi
derxistina şer wê ev mesele dîsa neyê veşartin. Erol efendî, jina wî û mele pê hisiyan e. Reşo pê dizane. Ez çi bikim, ez çi xweliyê li serê xwe bikim! Deremêt kuro, tiştê ku heta niha kesî ne kiribû min kiriye! Ma yabo, çawa min ê ne kiriba, temamê şeytan û meytanan li dor min civiyane.

Şeytanekî dinya xistiye qelaqê, îcar ê min tew pênc, şeş şeytan hene. Tobe
ya rebî tobe estexfîrulah. Ez ê xwe li ber navê bêbextiyê negirim. Eger kes bi vê bêbextiyê ne hisiyaba, bila bêbextî ba. Dijminayî bû xem ne dikir. Çawa dijminayî bû xem ne dikir! Tu çi dibêjî kuro! Di hindurê mala wî de li dor panzdeh zarokên hûr û mûr razayî bûn. Te bêşerefiyeke mezin kiriye! Erê bi Xwedê rast e. Min xwe gindorkî girêdaye û hayê min ji min ne bûye. Gava ev mesele li me derket, em ê nikaribin bi mêrik re pevçûnê

jî derxînin. Çimkî ji hemû alî de em neheq in, wê xelk me neheq bikin. Baş e ez çi bikim?.. «
Kolanên gund çamûrî bûbûn. Temo ji tirsa ku şekala wî di çamûrê de neviciqîne, xwas çûbû. Lê ji bîr kiribû ku mirov li ber xaniyê Circîs jî çixarê nakişîne. Eger çixare ne kişandiba, dibû ku Circîs ew li dor xaniyê xwe ne dîtiba.
Heso bi hêdî got:
»Ma te çi fêm kir Temo?«
»Xaniyê wî ji ê me saxlemtir bû. Ji bilî du dîwarên qesira wî, min temamê dîwaran saxtî kirin. Dîwar ne herifîne. Tiştek ne bûye. Îcar tu dikarî bêmitale rakevî. Yabo, ez jî dixwazim herim rakevim.«
»Ma kesî tu dît?«
»Erê erê, Circîs ez dîtim.«
»Te got çiii!«
»Mêrik di şibaka qesirê de rûniştîbû û hayê min jê tune bû. Gava ez di ber dîwêr re dimeşim, tu nabê ew jî min dibîne...«
»Ê dûv re?«

»Bangî min kir, ‘ lo lo tu kî yî, tu li wan deran li çî xwe digerî?’ got. Min jî tiştek li xwe çênekir, ez rast meşiyam û min berê xwe da malê.«
Heso bi wahc xwe bi ser hev de diguvaşt û bêsebir lê guhdar dikir.
»Yanî bi tenê hew evqask bû! Ma hûn bi hev re ne ketin devjengê jî, hi?«
»Na, hemû wek ku min ji te re got, ewqas bû.«
Heso bi herdu destan li kabên xwe xistin, dûv re destê xwe ê rastê he-jand û got:
»Lawo wilehilezîm, tu ne ê hewandinê ye, lê ez çi bikim. Niha ez te bikujim, wê dewlet jî min bi hesabê, ‘Heso bîr adem oldurdî’ tewqîf bike. Kuro bi telaq tu ne tu ‘adem’î, îcar lawo bila tu ‘adem’ bî û hew! De here ji xwe re razê û berî ku tu razê jî bazde ser Meyro, kûçik lawê berêz!..«
***
Banga sibehê lê xistibû. Ronahî ketibû dinyayê. Çûkên beytik xwe ji hêlî-nan berdabûn hewşan, dikirin wîze wîz û diçêriyan. Dengê teyr û tilûran ji nav rezê pişta gund dihat. Dîkan bang didan. Ji navtara jêr kerekî nêr diziriya. Dengê wî mîna borîzana şer qalind û bilind bû. Mîh ne dibariyan. Li ser gund ewr digeriyan, lê hemû jî ne ewrên baranê bûn. Bayekî hênik dixurbilî. Perîxanê ji ser birka gund dihat malê. Satileke ti-je av di destê wê de bû. Herdu tajiyên Mîrzo bi haweyê ku keroşk xistib-
238

in hesara xwe, li ser bênderên jêra gund bazdidan. Eskerên ser hidûd tabiyên xwe berdidan û bi terempêlên eskerî diçûn qereqolên xwe. Ronahiya fanosekê ji çavên terempêlan dida der. Rêya Îpekê ji terem-pêlan xalî bû. Qelebalixek ji mala Kenêr dihat. Dengê Kejê li ê hemiyan ferq dikir, lê dîsa jî mirov jê fêm ne dikir, bê çi digot. Melê bang nedabû. Sarê limêj dikir. Meyro bi Fehmiyê şivan re pez rast kiribû û qutik di-avêtin hindurê sobê. Sobe ne dadayî bû. Heso heta berdestî sibehê jî

kabûs dîtibûn. Bi destê sibehê re xewê lê giran kiribû.
Sarê:
»Meyro deyl Temo bike bila rabe ser xwe; bêhnek din wê esker bigirin ser gund...«
Xewê li Temo jî giran kiribû. Meyro ew şiyar kir, lê hîç ne dixwest ku rabe ser xwe.
»Keçê dev ji min berde, ez şevê din ranezame, bihêlê ez hinekî ji xwe re razêm.«
Sarê bi bêhntengî got:
»Zû xwe bide ser hev wê bêhneke din esker bigirin devê derî!«
Temo veciniqî:
»Eskerên çi yadê!«
»Ma qey te mayinên şevê din ji bîr kirin. Niha di nav mayinan de bi kê-manî pênc, şeş kuştî hene. Xwedê dizane bê niha çiqas birîndar jî ketine!«
Temo lihêf kişand ser serê xwe û di bin lihêfê de peyivî:
»Yadê, a te xewn e, te dîsa xewn dîtiye. Ne mayîn teqiyane û ne jî tu kes hatiye kuştin. De îcar bihêle ku ez ji xwe re razêm.«
»Kuro ev tu çi dibêjî! Bi mayinên şevê din re erd hejiya, erd!..«
»Yadê, wilehî tu xanî ne ketine. Limêja xwe bike û dev ji min berde.«
Sarê piştî ku hinekî bêdeng sekinî,« qey bi rastî min xewn dîtiye!« bi dizî got û dengê xwe hilda:
»Lawê kerê, ku dibêje 'te xewn dîtiye!' Ne mayinek, çar, pênc mayin bi dû hev de teqiyan. Ez û tu em çûn odê, cem bavê te. Ez giriyam, bavê te giriyê min bi xwe ne xweş anî û ji odê berda min. Ma çawa ev hemû dib-in xewn!..«
Meyro keniya:
»Yada Sarê, Temo henekan li te dike. Ma ne gava mayin teqiyan, ez jî bi we re rabûbûm. Melê li tenekê xist...«

Meyro bi gotina henekkirinê, rê ji Temo re vekir. Wî berî niha ne bi henekî, cidî gotibû.

239

SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

»Meyro qey te jî xewn dtiye« got û nema peyivî.

Ro baş bilind bûbû, gihabû delavan. Gund tevdigeriya. Bedranê muxtar bi çend hevalbendên xwe ve li ber sênca hewşa Circîs sekinîbûn. Ji rewşa wan xuya dikir ku hûrî hemû wê li wir biciviyana. Xwendekaran yek bi yek xwe ji malê berdidan û diçûn dibistanê. Sarê, Heso ji xew şiyar kiribû. Hemo berî Zibêr û Sadiq hatibû oda Heso. Miho û Selîm bi hev re û Simo jî bi dû wan de hatibû odê. Melê li ber deriyê xwe bi haweyê ku

hin gundî bangî wî bikin, piyase dikir. Ji hejandina herdu destên wî û nerînên wî mirov tê derdixist ku xwe bi xwe dipeyivî. Pêjina mamoste ne dihat. Pîrekên hûriyan her sibeh bi gavên re dewar didan ser hev, pîrekan dev ji garanê berdabûn; li ser dêlegura ku şevê din hatibû kuştin û xortan ew kişandibûn ber xaniyê Celîl, civiyabûn. Pîrekan dêla gurê, qûn û heta bi nîvê parxwanan jî jê kiribûn. Li gor wan dêla gurê sihûd dianî. Yanî pîreka ku gava piçek ji dêla gurê wek niviştê bi xwe ve daliqanda, wê sihûda wê veba û mêrê wê jê re misixur bûba. Bi kuştina gurê, Reşo di çavê gundiyan de bûbû qahremanekî mezin. Jina mamoste, gundî serwext kiribûn.

Pizûriyan garana xwe rast kiribûn. Garan gihabû pişta rez. Teyrekî reş mîna ku li mirîşkan digeriya li hindama mala Xelef li hewa sekinîbû. Dengê zerzûlan ne dihat. Ji nav xiramê qesrika binya Sirêçkê, kewekî berê xwe dabû goristanê û bi haweyê ku yasînan li miriyan bixwîne hebhebî dixwend. Kera Kerîm dîsa ji garanê mabû. Jina wî Hemdo bi bez ker

diajot û bang gavên dikir. Dora gavantiya îro a Zibêr bû. Sadiq Zibêr ji ber garanê vegerandibû û Hûto ji dêvila wî ve xistibû ber dewêr. Ji bilî Kerîm û Hûto temamê pizûriyan li odê gihabûn hev.
Zibêr:
»Pêjina eskeran nayê. Ev tiştekî ecêb e, seet bûye nehê rojê û esker xuya nakin!«
Temo bi haweyekî ji xwerazî:
»Qey bi me ne hisiyan e»got û di cih de gotina xwe birî.
Heso lê nerî û awir tê vedan.
»Hilkişe ser xênî û li ser rêyan binere kûçik lawê kûçik!«
Temo çû. Miho keniya:
»Zibêr, ez dibînim ku te gelek cil û mil li xwe kirine. Ma tu çiqasî li xwe bikî, hey wê te tazî bikin û li te xînin.«
»Yabo, ne min bi tenê, ji xeynî apê Heso we hemiyan xwe wek min girêdaye. Îcar çima tu henekê xwe bi min dikî. Ê min bêceme û şerwalek
240

e, tew îcar te du şerwal li xwe kirine. Ê min çakêt, ê te qapût û çakêt li te ye...«
Giriniya terempêlekê hat. Cefil li civatê ket. Bêî ku hin ji wan bangî Temo bikin, hemiyan xwe li devê derî qerase kirin û çeng bûn hewşê. Qemyona Feremezê Kwîtanê ji Sitilîlê dihat û diçû Nisêbînê. Di eslê xwe de a wî ne qemyon û ne jî bi navê tiştekî din bû. Serê wê ê qemyonê bû. Qeresêla wê ji a qemyonên ford kintir û li ser sê şivên hesinî wî bi xwe çêkiribû. Sindoqek bi textan li hev xistibû; hemû jî teneke kiribû û bi qeresêlê ve şidandibû. Piştî ku li hindama Şêxbat sindoqa wî tev li rêwiyan dipeke bestê, li ba Beşîrê qeynaxçî tankêreke hesinî çêdike û di-avêje ser qeresêlê. Rêwî di vê tankêrê de dibirin û dianîn û bi hesabê si-

warbûna qemyonê pere ji wan distendin. Dengê terempêla wî ji kîlometroyan ferq dikir. Dema ku terempêl ji Sitilê dihat û Atxê derbas dikir, mîna ku helîkopter di newalê de difiriya, deng derdixist. Hûrî û pizûriyan ji herkesî bêtir dengê terempêla wî nas dikirin. Lê civata Heso di vê bêhnikê de, ev deng hîç nas ne kiribûn.
Sadiq:
»Hey qeda xwedê pê keto, em ji desthilanîn xistin!« got û keniya.
Xelef beşişî. Peyv xist mista zimên, xwest ku bigindirîne, poşman bû û daqurtand. Destê xwe danî ser devê xwe, lê xwe ne girt.
»Sadiq tu jî tiştekî efû nakî. Tu dibê qey tu di nava mirov de yî. Ma em çawa bikin, bêbavan zalim in. Mirov ji zaliman bitirse, ne eyb e...«
Di ruyê wî de çar birîn hebûn. Şûna diriyê ku di kerînoka bêvila wî re çûbû xwar, bi qasî beyendûrekê mezin bû. Bêvila wî baş werimî bû. Xinxinokî dipeyivî.
Qaso:
»Ka qahremanê dêlegurê çima nayê civatê? Situyê jinên hûriyan tije qu... kir û wê here mektebê, ha! Ma jinên me jî ne wek ên wan bû! Çima dêlegur bi dest wan ve berda?..«
Xelef:
»Erê kuro, gava ez hatim odê, ê ne we ne dît bê van pîrekan çi dikirin ji serê hev! Heryekê kêrek xistibû destê xwe û rebena gurê ha ha diçilvi-randin.«
Sadiq:
»Erê wey, qîre qîra wan bû. Xensê û Koçerê xwe rakişandibûn hev. Koçerê jê re digot ‘te qu...ê min biriye, ka qu...ê min derxîne!..’ Rebena Xensê jî, ‘yadê wilehî min tu qu...ê te ne biriye weh!..’ digot.«

Zibêr kenekî fahş kir û peyivî:
»Ma dêla wê ji bo zilaman jî sihûdê nayine gelo?«
Xelef awirek dijwar tê veda:
»Mêrik qûnek bûye ha...« Civat bi gotina wî bêtir keniya.
Heso diponijî. Hîç ne dixwest bipeyive. Civatê jî ji ber wê bêkêfiya wî ewqasî ne diajot ser. Kenêr bêmad bû, zor dida xwe ku vê bêmadiyê nede der. Bi xwe hisiya bû ku ne baş kiriye. Poşman bûbû. Yekliban gotinên vala dikirin û xwe di ber re dikenand. Kêfa Simo li cih xuya dikir. Wî û Sadiq bi qeşmeriyan dabûn ber hev û kenê xwe li hev dikirin. Hemo kêm dipeyivî. Zibêr ji herkesî bêtir ditirsiya. Wek dizan li devê derî dinerî û guhên xwe bi ser şibakan de ker kiribû. Qaso bi haweyê ku wextî esker bi-
girin ser gund, qerevîzkî rûniştibû. Serê xwe berdabû ber xwe û tiliya xwe a işaretê bi çementoyê difirkand. Miho ji herkesî bêtir dipeyivî. Kê çi digot, wî xwe di ber re radikir. Temo hîn jî li ser xênî bû çavdêrî li ser rêyan dikir. Sarê çûbû aliyê malê û haziriya çûna Reşo dikir.
Reşo ji midîrê dibistanê destûra rojekê sitendibû. Lê li xwe kiribû du roj. Li lîseyê sinifê yekê dixwend. Birayê wî Seydo jî li dibistana ortê sinifê dawî dixwend. Reşo bi mebesta pevçûna ku doh na pêr na pitirpêr der-
ketibû, hatibû gund. Li kolanên qijla Nisêbînê ew û birayê xwe di xaniyekî bi kirê de bûn. Bi giştî di rojên înan de dihatin gund û yekşemê jî diçûn Nisêbînê.
Hûrî li mala Circîs vehewiya bûn. Mele, Mîrzo û Erol jî di nav wan de bûn. Hemû bi bûyera şevê din agahdar bûbûn. Lawê Circîs Bozan pêşî pense û kîsikê Simo ê ku şevê din li şûna xwe hiştibûn û dûv re jî fitîlên deremêtan dibîne. Fitîl li wê navê belav bûbûn. Lê li gor ku Bedran dig-
ot, »Bi xwe şiyar nabe heta ku çavên wî bi fitîla deremêta neteqyayî

nakeve.« Ji herdu deremêtên ku di bin qorziya dîwêr de bi cih bûbûn, yek jê ne teqiyabû. Pîjek bê çi ye ji dîwaran ranebûbû. Tam li gor dilê Heso encam dabû. Piştî poşmaniya xwe, wek pîreka ku mêrê wê li hidûd dix-ist, berzûrî Xwedê bûbû ku tiştek bi dîwaran ne hatibe.
Melê digel ku dizanîbû kûçik bi pez re çûye, ji binya hewşê bang kir, »Malîno kûçik neyê min!«
Sadiq pêrgî wî çû. Mele bêî
ku bi Sadiq re bide û bistîne, bi lez xwe avêt odê. Gurinî bi civatê ket, dîsa herkes ji ber rabû û cih jê re xweş kirin. Mele li ber sobê li himberî hemiyan li ser kursî rûnişt. Bêhna wî teng bû. Eniya xwe difirkand û serikên simbêlên xwe dikirpitandin. Heso mesele fêm kir. Kenêr bi tirs li
242

melê nerî. Simo bêxem rûniştibû. Guhên Zibêr û Hemo wek guhên roviyan bel bûn. Temo li ser xênî piyase dikir.
Heso:
»Xwedê xêr bike Seyda dîsa çi qewimiye?«
»Ne xêr e. Heso hişê xwe bîne serê xwe û li min guhdar bike. Hinekan şeva çûyî deremêt xistine bin xaniyê Circîs. Ew vê meseleyê dixin situyê we. Circîs bi dû ku deremêt diteqin bi nîv seetekê, Temo li dor xaniyê xwe dibîne« got û sekinî.
Heso pêşî ruyê xwe tirş kir, xwest ku konebaziyê bike û bibêje, »Ma mele tu bawer dikî ku Temo bikaribe tiştekî wilo bike?« bi xwe hisiya ku wê bi gotineke wilo tiştekî safî neke, dev jê berda.
»Ê dûv re?«
»Eger we ev xerabiya ha ne kiribe, yek bi yek werin mizgeftê û sûnd bixwin. Eger hûn sûnd nexwin, wê mesele pîs bigere. Îcar eger bi rastî ev yeka ha ne bi destê we bûbe, wek camêran sûndê bixwin. Sûnd ji bo we

ne kêmanî ye.«
Civat ecêbmayî ma. Ew li bendî tiştekî din bûn, tiştekî din derket holê. Heryek ji hindama xwe de keliya, »Wî deremêt xistiye bin xaniyê xwe, ew çi kûçike ku em jê re sûnd bixwin!..«
Zibêr rabû û destê xwe bi ser melê de hejand:
»Hîn ji serî de dest bi derewan kiriye. Dilê wî li kê bişehetiya belkî me qebûl bikira, lê ma Temo ê dilşehitandinê ye, hi! Ew wek melayiketekî ye...«
Heso serokatiya xwe bi kar anî û bi haweyê ku ji berê de qerara xwe dabe, dest bi peyvê kir:
»Herkes bila devê xwe bigire û li min guhdar bike! Em ê yek bi yek ji wan re sûnd bixwin ku hayê me ji vê meseleyê çênebûye, ewqas. Seyda dirêj neke, rabe here mizgeftê!«
Di eslê xwe de kêfa sextekarên wek Zibêr pir hatibû ku bûyera şevê din ne mayin, deremêt bûye. Lê ji herkesî bêtir jî wî sûndxwarin bi xwe ne xweş dianî. Tirsonekê herî mezin ew bû û di vê bêhnikê de jî mêrxasiya herî mezin wî dikir. Bilind dipeyivî û sûnd di derbarê tirsonekiyê de rave dikir. Ji civatê jî destek distend.
Heso xwe aciz kir. Destê xwe ê rastê bilind kir û lê hejand:
»Zibêr min nekufirîne, li cihê xwe rûne û devê xwe bigire!«
Kenêr xwe avêt pişt:
»Apê Heso rast dibêje, em mecbûrê sûndê ne. Helbet hinekan deremêt

xistine bin xênî. Îcar dibe ku mirov karibe qesda kuştina xwe, lê mirov nikare qesda kuştina temamê kufletê xwe bike. Ez bawer nakim ku Circîs deremêt xistibe bin xaniyê xwe. Li vê mentîqê gelek dijminên me hene.

Hin ji wan bi bafîka ku me bi hev bidin kuştin, deremêt xistine bin xaniyê mêrik. Çima hûn hişê xwe nayînin serê xwe, weh! Sûndxwarina me ji ne sûndxwarinê çêtir e. Gava ku me sûnd ne xwar û me şer derxist, wê xelk ji me re çi nebêjin!..«
Mele çû. Sarê dengê wan bihîstibû. Ji aliyekî de kêfa wê hatibû ku mayin bi qaçaxçiyan de ne teqiyane û ji aliyekî de jî aciz bûbû ku pizûrî bi karekî wilo xerab rabûbûn. Dilê wê li Simo dişehetî. Lê Simo jî bêşêwira Heso wê nikarîba ev bûyer bikira. Wilo difikirî. Civatê Temo peyivandibû. Eger Heso berî wî ne gotiba »Temo, heta destê sibehê li ba min bû«, Temo wê rasterast bipeyiviya. Zena pizûriyan hemiyan li ser Simo civiya bû û wî jî habela li xwe dida mandelê. Li çavê Kenêr û Heso temaşe dikir û sûndên herî mezin dixwarin.
Xelef da pêşiya pizûriyan û berê xwe dan mizgeftê. Necîmê hûrî, Mîrzo û mele li mizgeftê bûn. Ji bilî Reşo û Heso mêrên pizûriyan bi carekê ve li ser ku hayê wan ji bûyerê ne bûye, sûnd xwarin. Hûto li ber garanê bû. Li gund ba jî qîmet ne dikir ji xwe. Circîs ne dihişt ku ew sûnd bixwe. Melê piştî ku pizûrî sûnd dan, bi Qurana xwe ve hat odê. Di vê bêhnikê de dîsa civat digeriya. Pizûrî yek yek, dudu dudu dihatin odê. Mele li himber Heso çong berdan erdê:
»Bibêje, bi vê Quranê min deremêt ne xistine bin xaniyê Circîs; bi vê Quranê hayê min bi deremêtan ne ketiye; bi vê Quranê ez nizanim bê kê deremêt xistine bin xênî!«
Heso sekinî û keserek veda. Çavên xwe li ser zilaman gerandin û dûv re jî ziq li melê nerî. Destên xwe bi hev firkandin û ber bi Quranê de bir. Destê xwe ê rastê bilind kir, devê xwe dagirt û dîsa sekinî. Sarê bêhna xwe
teng kir:
»Sûnd bixwe ku Quran li ser dilê te xîne, hey deh top li rih keto! Te ew

kafirî kiriye, te te te!..»got û bi lez ji odê derket.
Heso bi haweyekî cidî ji civatê re got:
»Min û seyda bi tenê bihêlin.«
Hevalbendên wî ode terk kirin. Kenêr piştî ku li Heso nerî û hinekî tê de fikirî, giran giran meşiya û çû.
»Seyda, ez naxwazim sûnd bixwim. Min fêm bike.«
»Heso, ez te fêm dikim û dilê min jî ji te re dixwaze; lê ez ê nebim şirîkê
244

gunehê te. Ez mirovekî misilman û xwedaperest im. Di vê sûnddanê de Circîs ez kirime wekîlê xwe. Û min jî qebûl kiriye. Ez nikarim bextê xwe biavêjim. Tu çawa bikî, ez ê jî wê ji Circîs re bibêjim ewqas. Tu sûnd dixwî, yan na?«
Heso fikirî û melê jî dengê xwe ne kir.
»Ez sûnd nexwim, wê ev mesele li ser min bîmîne. Wî çaxî jî şerekî nuh li dar dikeve. Em ê gelek mêran ji hev bikujin. Ev ne bû. Ez sûnd bixwim, wî çaxî jî wê Xwedê li min bê xezebê. Ez yekî bi tenê me. Hema Xwedê çi dike ji min bila bike. Ev baş e« got û çavên xwe girtin.
Bi haweyê ku Quran pê nehise, pir bi dizî serê tilîkên destê xwe ê rastê gihand Quranê û ji nişkê ve li bin zikê xênî nerî. Pêşiyekî li hewa dilîst. Wî hinera mejiyê xwe bi carekê ve li ser vî pêşî civand. Pêşî di hindurê çavên wî de lîst û bi qasî gayekî mezin bû. Di hikmê neh, deh saniyan de ji mezinahiya vî pêşî, hindur yekser reş bû. Heso xwe çeng kir melê. Devê xwe xist sênga wî û wek zarokan giriya. Dilê mele pê şewitî, wî jî dest bi girî kir û bi xwedayê xwe re peyivî:
»Ya rebî tu xefûr û kerîm î. Ez dizanim ku te ecêbek mezin şanî vî ebdê xwe ê gunehkar kir. Lê ya rebî min bibexişîne, ez mecbûrê ku avekê li vî agirî bikim. Wê hevdu bikujin. Şeref û namûs û erz û eyalên wan, wê di

nav lingên romiyên teres de bitelife. Bila rûreşî barê min, dojeh mala min be û namûsa vî miletî nekeve nav lepên eskerên tirko! Ez ê bextê xwe xerab bikim û ji Circîs re bibêjim ku Heso sûnd xwariye« û bi lez rabû. Wek gule pekiya hewşê. Li Kenêr qelibî, şiqamek li bin guhê wî xist û bi zirt bangî Sarê kir:
»Circîs dixwaze ku Reşo jî sûnd bixwe!«
Sarê di cih de soro moro bû û yekser ew bersivand:
»Dinya jî xerab bibe ez nahêlim ku Reşoyê min sûnd bixwe. Hemû çûne ser kufirê, tîra Xwedê di wan de nare!« Destê xwe ber bi Reşo vekir:
»Kafirno, hîn şitil e, şitil! Hûn ê çawa destê wî li Quranê xînin!«
Melê Quran bilind kir ku li erdê xîne. Di cih de poşman bû. Quran he-jand û berizî Sarê.
»Nalet li te jî bê, nalet li we hemiyan bê, Xwedê xezebê li we bibarîne! Temam bila Reşoyê te jî sûnd nexwe!«
»Waweylê waweylê li min pepûkê, ev mele jî dîn kirin!«
»Hiş nepeyive!« melê got û ber bi mala Circîs de lezand.
245
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ

Sala 1977an
Mele Salar ji Circîs re bextê xwe avêtibû ku Heso û Reşo jî sûnd xwarine. Lê digel vî haweyî Circîs dîsa jî rehet rûnanê û li Reşo gilî dike. Polîs ji dibistanê Reşo digirin û wî teslîmî qereqola Sitilîlê dikin. Mele û Sarê bêhnçikyayî diçin Sitilîlê, xwe diavêjin tor û bextê başçawîş. Çil û sê hezar lîreyên Heso ên girêdayî hebûn. Sarê pereyan hemî bi xwe re hiltîne, kîsikê pereyan li ber başçawîş vala dike û dibêje, »Lawê min berde û ev pere hemû ji te re.«
Ji ber ku lawê wê di kontrola polîsan de hatibû qereqolê, başçawîş

rasterast nikarîbû lawik berda. Mecbûr bû ku ew bişanda dadgehê. Soz dide Sarê ku wê Reşo li dadgehê bê berdan. Piştî ku başçawîş 43 hezar wereqeyan berdide bêrîka xwe, hema di cihê cih de bi Reşo re du cendirman kar dike û wan dişîne Nisêbînê. Di eynî rojê de wî derdixînin dadgehê. Lê mixabin dadger jî dinyayê bi ser serê Sarê de diherifîne û Reşoyê wê tewqîf dike. Polîs Reşo dibin girtîgehê, Sarê li Nisêbînê dimîne û mele jî teqeze texsiyekê kirê dike û berê xwe dide bajarê Batmanê. Mele, Xalitê ku endamê PDKTyê bû bi xwe re radike û bi şev digirin ser mala Circîs. Wî xewle dikin û jê re dibêjin:
»Du rê ji te re hene; ya tû ê îfada xwe ji ser Reşo biguherînî û ya jî kuştina te!«
Circîs ji desthilanîn dikeve. A din î rojê Salar û Circîs diçin Nisêbînê. Circîs îfada xwe diguherîne. Piştî panzdeh rojan Reşo tê berdan û Circîs jî ji şahidiya bi derewan, sê mehan ceze dixwe. Bi tewqîfkirina wî kêfa Sarê pir hatibû. Reşo sitûna dilê wê bû. Dê jê re bûba pîlot û bi balafiran agir li ser qereqolan bibaranda. Bi hezaran esker dikuştin û ji herêmê zilm radikir. Ji bo kuştina eskerekî ne çil û sê hezar, wê temamê malê xwe feda dikir. Ji ber vê yekê bû ku alîkarî bi ên wek Xalit re dikir. Dijminê eskeran kî diba bila bûba, dostên wê bûn. Eger bi qasî serê derziyê dijminahiyeke Circîs bi eskeran re bûba, Sarê ya Heso hedayet dikir û ya jî dikuşt. Di civatê de, wê bi xwe ev gotina ha dikir. Panzdeh rojan li Nisêbînê mabû. Bi roj li ber deriyê girtîgehê bûbû pepûk û bi şev jî mîna
246

guran bi seetan li derdora girtîgehê geriyabû. Reşo ji bo wê hertişt bû. Di hikmê şeş salan de, li Zorava û temamê herêmê gelek tişt hatibûn guhertin. Zoraviyan bi dû girtina Circîs de tu carî bi hev re şer ne kirin. Bêî ku hin wan li hev bînin, li hev hatibûn. Lê têkiliyên wan jî pir bi sînor

bûn. Ne diçûn malên hev, xerabiya hev jî ne dikirin. Bêşa ku başçawîş di-avêt ser gund, bi hev re didan hev û bêş teslîmî Bedran dikirin. Gelek ji wan dewlemend bûbûn. Heso terektorek û texsiyek kirîbû. Circîs jî du texsî û terektoreke xwe hebû. Zoraviyan pênc texsî û sê terektor kirîbûn. Reşo û lawê Îdrîs Serdar ku neviyê Circîs bû, herduyan jî di imtihanên unîversîteyê de zanîngeha hiqûqê a Enqerê qezenc kiribûn. Li vê zanîngehê Reşo du salan û Serdar jî du sal û nîvan dixwîne. Di salên xwendinê de bêî ku ji malbatê hin bi wan bihisin, Reşo beşdarî nav refê rêxistina »Partiya Komunîstên Proleterên Kurdistanê PPKK« û Serdar jî beşdarî nav refê PKGKê dibe. Ji bavên xwe bi hesabê ku xwendinê dikin, pereyan distînin û di xebata rêxistinî de bi kar tînin. Sarê bi armanca ku Reşo ne bûbû pîlot xwe jê xeyidandibû. Xwe aciz dikir û digot:
»Kûçik lawê kûçik, ji Sarê re qereqol fetih kirin, hi! Şîrheramo, heq û hiqûq û edalet û medaletê dixwîne, tirrr! Wê di mehkeman de heqê mîhê li ba gur biparêze, bênamûs lawê bênamûsan!..«
Mafir, Reşo piştî ku jê re dibêje, »Ji kurdan re pîlotî qedexe ye... « û ew jî bawer dike, dîsa jî haş nabe. »Ma te nikarîbû mektêbên ku bombe û sîlehan çêdikin jî bixwenda, hi!« dibêje û pê re li hev nayê.
Lawê Kenêr Restem û ê Erol Sînan li Diyarbekirê zanîngeha tibê, lawê Zibêr Aydin li Stenbolê li zanîngehê beşê edebiyat û zimên, lawê Luqmên Bişar li Enqerê enstîtu beşê metamatîkê û lawê Bozan jî li Stenbolê mihendizî dixwend. Gelek xort jî bûbûn mamoste. Herêm ji xwendekaran tije bûbû. Ji sala 1970î û vir ve xwendekarên kurdan »Partiya Kominîstên Gundiyên Kurdistanê PKGK, Partiya Herî Kominîstên Kurdistanê PHKK, Partiya Sosyalîstên Memûrên Kurdistanê PSMK, Partiya Maoîstên Kurdistanê PMK û Partiya Reel Kominîstên Kurdistanê PRKK« damezirandibûn. Hemiyan jî doza dewleteke kurdî dikirin. Bi damezirandina van partiyan re, li gundan

berberî rabûbû. Têkiliyên navbera xelkê, polîs û eskerên dewletê bi sînor bûbûn. Bêş rabûbû. Li polîsxana Nisêbîne êşkence her çiqasî bi temamî ranebûbû jî, bi êşkencê kesek ne dihat kuştin. Li qereqola Sitilîlê û temamê qereqolên gundan êşkence rabûbû. Başçawîşan ji gundiyan re »yoldaş« digotin. Başçawîşê Sitilîlê Mustafa li qahwê bi zilaman re bi kax-

etan û Fatîme xanim jî bi xortan re bi gokê dilîst. Vê jinikê berî xortên herêmê di xwe de şoreş kiribû. Gava bi xortan re bi gokê dilîst, te digot qey li ber behra Mêrsînê ye, tena derpî û bi sudyen dilîst.
Xwendekaran keça Zeroyê sitilîlî Hedo revandibûn çolê û kuştibûn.
Bavê wê ji gund bar kiribû.
***
Kelkela germa havînê ye. Rivîn ji taht û latan diçin. Bêhna êgir ji erdê tê, erd dikele; mîna ku agirekî mezin di binê erdê de hatiye dadan, pêtî ji qelşan dide der. Hawêrdor rewrewk girtine, leylan leylanê hiltîne. Pûş û pelax qemirî ye û di bin lingên çûkan de dişike. Pişta zinaran bûne wek sêlek sor. Çûkan xwe berdane bin sîdaran. Zimanê kûçikan di tûlê de kişiyane; tu tivingan berdî wan ji cihê xwe dernakevin. Cil bûne pîşo. Ji rivînan bêvila mirov dişewite, bêhn dernakeve. Çirûskeke agir dikare deşt û çiyê bişewitîne.
Heso tena bêceme û fanêreyê sertazî li ser kulêv di nav koma pizûriyan de rûniştiye û çayê vedixwe. Sê xortên bi çek derbasî odê bûn. Dudu jê bi demaçe, yek bi keleşkof e. Demaça yekî map ya ê din astrake nehderbî ye.
Yek jê simbêlbor, yek simbêlhej û ê din jî simbêlşor e. Şekalên hersêyan jî meqab in; bi çakêt û bi pantor in û li serê xwe jî çefiyên soringî pêçane.

Yekî ji wan qazaxekî bi berstik li xwe kiriye. Yê simbêlşor bi qapût e jî. Qapût li qama wî a kin naxwe. Ne dikenin, ne digirîn. Madê wan ne tirş e, lê pir jî cidî ne. Ji xwêhdanê bûne av. Serê zendika çakêtê xortê ku li ber
derî sekiniye, şil bûye. Çavên wan di xwêhdanê de bûne bizot. Hilm ji serê ê pêşî diçe. Çavên wî jî terifî xuya dikin. Çend tayên xernûfê bi piş-ta çakêtê xortê qamqutî ve ye. Qilçixên simbilên genimî bi qeytana şekalên hemiyan ve zeliqîne. Qurîncek jî bi wan ve hene.
Çekdaran bi hevdu re gotin:
»Merheba ji civata we re!«
Mele berî herkesî rabû ser xwe. Sadiq pêrgî wan çû. Heso dengê xwe bi ser ê civatê xist:
»Wey merheba û hezar carî merheba ji we re. Hûn di ser herdu çavên min re hatin. Kerem bikin rûnin. Temo, ji van xortên delal re pêşî xwar-inê û dûv re jî çayeke giran bîne...«
Piştî ku şekalên xwe eskerkî rêz kirin, hersê jî li kêleka hev û li himber Heso rûniştin. Ne çakêt û ne jî çefî ji serê xwe kirin. Xortê simbêlşor bi haweyê ku qêpût ji xwe bike, li ê simbêlbor nerî û di cih de jî berê xwe jê
248

guhert. Qapût ji xwe ne kir. Çarmêrkî rûniştin. Zibêr çixare li ber wan gerand, Kenêr çeqmaq pêxist û Miho jî satileke av anî. Yekî ji wan çixare ne dikişand. Heso ew nas ne dikirin. Lê Mele Salar yek ji wan nas dikir. Heso:
»Xortino li qisûrê nenerin, lê ez telebên bi sîleh nuh dibînim. Ma ev hûn ji kîjan partiyê ne, eyb nebe?«
Xortê ku simbêlbor bû bi haweyekî kemlan peyivî:
»Apo, em ji Partiya Komunîstên Proleterên Kurdistanê ne.«

»Wilehî navê we mîna ku hinekî bi min ecêb hat. Lawo li qisûra min nenerin, ez tiştekî di dilê xwe de nahêlim. Ez mirovekî deqarû me.«
Piştî ku xortê simbêlşor got:
»Şoreşgerî ji xwe ev bi xwe ye, apo« û hema pê re li ê simbêlbor nerî.
»Wek we, gelek partiyên teleban tên vir û diçin. Herkes tiştekî dibêje... Îcar hûn ê bi çi rêyê Kurdistanê ji bin zilma tirko xelas bikin?«
Xortê ku Simbêlbor bû, pêşî çep û rast simbêlên xwe firkandin. Dûv re jî boqên simbêlan berjêr kirin, lêva qalind di bin wan de wek sefirneyekê xuya kir.
»Em ê bi devê tivingê kurd û Kurdistanê xelas bikin, apo...«
Wî xwest ku dirêj bike, Heso rê nedayê. Gelek caran li ên wek wan guhdar kiribû. Dizanîbû ku gotina wan nebire, ew ê bibêjin û hey bibêjin.
»Ev baş bû. Rast e, ku ne bi devê tivingê be, tiştek safî nabe. Ma lawo navê serokê we çi ye?«
Simbêlşor:
»Apê Heso, navê serokê me Circîs Bîtîren e, lê em jê re Reyis dibêjin.«
Heso wek hespê ku ji mêr bicefile, rimekê bilind bû. Çavên wî wek du tasan vebûn. Sênga xwe heta bi çongan tewand, serê xwe ber bi wan de bir û rakir:
»Te go çi yabo qurbano? Te go çiii?«
249
SÊ ŞEV Û SÊ ROJ
PERWÎZ CIHANÎ
Roman
**

SILTANÊ FÎLAN

Yaşar kemal
Roman
Wergera ji tirkî: Mustafa Aydqgan
NÛDEM
Weşanên NÛDEM 36
Siltanê Fîlan
Stockholm: 1998
© Kurdiya wê Weşanên Nûdem
Pergala bergê û rûpelan NÛDEM
Wêneya bergê: Fîlek
Çapa bergê: Jakobsbergs Tryckeri
ISBN: 91 88592-36 7
Adres:
Nûdem Box 177
177 23jarfalla-Sweden
Tel û Fax: 8-580 131 62, 8-583 564 68
PÊŞGOTIN
Di destpêka salên heyştêyî de ez li taxeke derveyî Stockholmê bi cih bûbûm. Mala min nêzîkî kitêbxaneya taxê bû.
Herçiqas ez hinekî hînî zimanê swêdî bûbûm jî, dîsan min bi piranî pirtûkên bi tirkî dixwendin. Salên ku ez behsa wart dikim hê bi zimanê kurdî çi bigire pirtûk tunebûn. Ji nav pirtûkên ku min ji pirtûkxanê bi emanetî dibirin malê û dixwendin gelek jê romanên Yaşar Kemal bûn. Romanên Yaşar Kemal ez ber bi cîhana çîrokî û zaroktiyê ve dikişandim. Bi tnce Memed re ez jî dibûm Ince Memedek û min li dijî zilma Abdî Axa serî hildida. Di romanên wî de ez dibûm şahidê tevkujiya ermeniyanj min mêrxasî û bedewiya kurdan nas dikir. Ez gav bi gav li Çûkûrovayê digeriyarri.

Min têkiliyên axê û traktorê û bi wê re mirina sîstema feodalîzmê
û pêşketina kapîtalîzmê didît. Çûkûrova geh li ber çavên
min dibû deryaya kul û derdan geh jî dibû dermanê çareseriya
wan. Erê, min romanên Yaşar Kemal dixwendin û min şiroveya
wan ji hevalên xwe yên nêzîk re dikir. Rojekê, min ji pirtûkxaneyeke
tirkan ya li Stockholmê çend pirtûkên Yaşar Kemal
kirîn. Dudu ji wan pirtûkên çîrokan bûn û li ser yekê jî "romana
zarokan" hatibû nivîsandin. Min romana "zarokan" danîbû
quncikekê. Demek di ser re derbas bû. Ez li romana ku li ser bergê
wê "romana zarokan" hatibû nivîsandin vegeriyam. Min
çend rûpel jê xwendin, min xwest ez dev jê berdim, lê min nikarîbû.
Min ew xwend. Min xwe tê de dît, min kurd tê de dîtin,
min jîrîtî û liberxwedana gêrikan şiband ya kurdan û hovîtî û
êrîşkeriya fîlan jî şiband ya serdestên tirkan.
Fîl tên welatê gêrikan, dixwazin gêrikan asîmîle bikin, dibistanên
fîlan vedikin, gêrikan tê de bi zimanê fîlan perwerde dikin,
dixwazin ew ji gêriktiya xwe bi dûr bikevin, bibin fîl û welatê
wan jî bibe welatê fîlan. Gêrik jî perçe dibin, hinek fîlîtiyê qebûl
dikin, hinek jî qebûl nakin, li ber xwe didin, dixwazin gêriktiya
xwe û gêrikistana xwe biparêzin.
Yaşar Kemal di vê romana xwe de du karakterên heywanan
hilbijartine; fîl û gêrik. Fîl ji ber girsbûna xwe nîşana zilmê hatiye
hilbijartin û gêrik jî ji ber hûrbûna xwe nîşana xebat û liberxwedanê.
. . Ev romana ku mîna romaneke zarokan hatibû pêşkêşkirin,
di destpêkê de bala xwendevanan nekişandibû. Lê paşê hin
çepên tirkan ew mîna serîhildana karkeran ya li dijî serdestan dîtibûn,
gelek der û doran jî ew mîna serîhildana çîna karker ya li
dijî emperyalîzmê anîbûn zimên. Dibe ku jî weha be, mirov gelek

motîvên çînayetiyê jî tê de dibîne û ji ber çepîtiya Yaşar Kemal ya wê derhê wê xwestibe motîvên çînayetiyê jî bi kar bîne. Lê gava wek kurd mirov romanê dixwîne, mirov digel motîvên çînayetiyê bi giranî motîvên milî tê de dibîne. Tevî hewildanên rengê sor û motîvên çînayetiyê yên bi vî rengî hatine xemilandin jî pirtûk her wek pirtûkeke berxwedana gelê gêrikan ya li dijî êrîşên kolonyalîzmê ye. Di vê maneyê de serîhildan û şoreşeke neteweyî ya pêşengê wê hesinkerekî ku di bin tesîra Kawayê hesinker de hatiye hilbijartin. Bi vê ve girêdayî ew berxwedana gelê kurd e. Ez bawer dikim wê ji ber van motîvên miB û ji ber tirsa Yaşar Kemal ya ji sîstemê be ku wî ev romana xwe mîna romaneke zarokan pêşkêş kiriye. Di sîstemên nedemokratîk û dîktator de geçend gelek
caran nivîskar û hunermend bi riya sembolan neheqiya sîstem û civatê tînin zimên.
Berî bi heft-heyşt salan min pir dixwest ku ev roman wergere kurdî. Min rojekê bi dostê xwe Mustafa re li ser vê romanê sohbet kir û min pêşniyaza ku ew romanê wergerîne kurdî jê re bir. Wî jî roman xwendibû û pir kêfa wî jê re hatibû. Wî pêşniyaza min maqûl dît û tavilê dest bi wergerandina wê kir. Lê bi tenê çend rûpelên pêşî jê wergerandin û wisa hişt. Gava me weşanxaneya Nûdemê ava kir, min dîsan jê xwest ku ew vê romanê wergerîne zimanê kurdî. Wî behsa zehmetiyên wergera vê romanê kir. Bi rastî jî weha bû, zehmet bû. Wergerandina romana ku bi îdyoman mişt e ne hêsan bû. Me di dawiya sala 1996an de bi hev re Yaşar Kemal li Stokholmê dît. Wê demê Yaşar Kemal ji ber gotareke xwe ya ku di Der Spiegelê de weşandibû ji Tirkiyeyê gelek êrîş hatibûnê. Kemal di gotara xwe de behsa fîl û gêrikan

dikir; yanî behsa tirk û kurdan, behsa polîtîkaya tirkan ya asîmîlekirina kurdan kiribû û ji ber gotinên xwe mehkûm bûbû. Hin dostên wî yên nêzîk jê xwestibûn ku ew xwe bide alî û demekê ji Tirkiyeyê bi dûr bikeve. Ew jî çend mehekî hatibû Stokcholmê. Nivîskarekî dinyayî ji bo çend rêzan surgun bûbû. Gava me di hevdîtina xwe de jê re behsa wergerandina Siltanê Ftlan kiribû, ew bi qelafetê xwe yê girs ji cihê xwe pengizî bû û mîna zarokekî kêfxweş bûbû. Ne ji ber ku pirtûkeke wî werdigeriya zimanekî din kêfxweş dibû, lê ji bo ku wê Siltanê Fîlan wergeriya zimanê kurdî kêfxweş dibû. Wî digot ecêb e, ku heta niha kurdan ev romana wî ferq nekiribûn. Bi xwe got, ku hilbijartina me hilbijartineke pir baş e û xwe da ber hemû piştgirî û alîkariyan. Gava Mustafa jê re behsa zehmetiya zimanê wî û term û îdyoman kir, wî dîsan bi kêfxweşî xwe da ber şirovekirina hemû gotin, term û îdyomên zehmet. Wê rojê Yaşar Kemal bi dilekî geş pesnê nivîsandina kurdî da, ji stran û destanên kurdî bi kurtî be jî nimûne anîn, ji bo kurtedemekê be jî bi kurdbûna xwe şa bû, şabûna xwe anî zimên û ji me hêviya berdewamiya nivîsandina kurdî kir.

Di hemû sohbeta me de ew bi kêf bû, devbiken bû, dilşa bû. Kurdîtiya wî ji tirkîtiya wî girantir bû. Bi zimanê "em" û "ew" dipeyivî. Yanî "em kurd" û "ew tirk". Behsa dewlemendiya edebiyata kurdî ya devkî kir. Behsa stran û destanên kurdî, dengbêjiya kurdî, bedewî û mêrxasiya kurdan kir. Gava me jî pirsa "çima tu bi kurdî nanivîsînî?" jê kir, wî got, ku ew pir dixwaze lê mixabin ku ew nikare. Erê ew bi kurdiya devkî dikare bipeyive û ji stran û destanên kurdî baş fêhm dike, lê herçî nivîsandina kurdî ye ew nikare û ji niha û pê ve jî jê re pir zehmet e ku hîn bibe.

Loma min xwest ez hinekî dakevim jiyana wî ya zaroktiyê û bibînim bê çima ev nivîskarê mezin û gerdûnî ji.zimanê xwe bi dûr ketiye û ziman û kultureke din gerdûnî kiriye.
Kurdbûyin û nekurdbûyina Yaşar Kemal hem ji aliyê kurdan ve û hem jî ji aliyê tirkan ve hertim hatiye minaqeşekirin. Ji herdu aliyan ve jî bi zimanekî tûj hatiye rexnekirin. Kurd çûne ser wî ku çima ew bi kurdî nanivîsîne, çima ew nabêje ew nivîskarekî kurd e, an jî çima ew stran û destanên kurdî didize, bi tirkî dinivîsîne û dike malê ziman û edebiyata tirkan. Herçî tirk in, çi cara ku Yaşar Kemal tiştek di derheqê gelê kurd de an jî di derheqê demokratîzekirina Tirkiyeyê de nivîsandibe, ew bûye hedefa rexne û êrîşên tûj. Lê Yaşar Kemal nivîskariya xwe dewam kiriye û îro bûye nivîskarekî cîhanî. Tiştê ku min ji devê vî nivîskarê mezin î cîhanî bihîst ku ew kurd e, ji malbateke kurd e û bi vê jî serbilind e. Di çavkaniyên nivîskî de jî tê gotin ku Yaşar Kemal di malbateke kurdîaxêv de hatiye dinyayê. Hê Yaşar Kemal biçûk e, malbata wî ji Wanê surgunî Çûkûrovayê dibe. Ew li gunpesnê gundê
Hemiteyê bi cih dibin. Li gorî çavkaniyên nivîskî gundê Hemiteyê gundekî tirkan e û ji malbata Yaşar Kemal pê ve kes li wî gundî bi kurdî napeyivin.
Bavê Yaşar Kemal di sê-çar saliya Yaşar Kemal de ji aliyê zarokekî nav mala xwe (ewladlixê) xwe ve li mizgeftê, di ser nimêjê de bi kêran tê kuştin. Ew bûyera ha, li welatê xerîbiyê dilê Yaşarê biçûk perçe dike, ew şok dibe û ji ber wê şokê, piştî mirina bavê xwe bi çend salan nikare bipeyive, gava dipeyive zimanê wî li hev digere. Kuştina bavê wî, mîna ewrekî reş bi ser malbata wî ya surgunbûyî de digire, ji ber adet û toreyên kurdan yên kevin,

apê Yaşar Kemal bi diya wî re dizewice û Yaşar Kemal li ber destê apê xwe digihê. Apê wî ku berê jî zewicî bû dibe xwediyê du jinan. Jina wî ya duwem, yanî diya Yaşar Kemal jî ji Wanê, ji malbateke esilzade ye û bi kurdîtiya xwe jî heta mirina xwe serbilind bûye. Ji ber ku mala bavê wê maleke xuyayî bûye, li Wanê stranbêj û dengbêj ji mala wan kêm nebûne û diya wî hertim bi gotina ku "Evdalê Zeynikê li mala me destê xwe dida ber guhê xwe û distira, an jî em ji maleke ku Evdalê Zeynikê hertim lê dibû mêvan tên" digot û pê xwe serbilind û bi esil hîs dikir. Wê ji ber tesîra stranbêj, dengbêj û bi gotina diya Yaşar Kemal Evdalê Zeynikê be ku Yaşar Kemal hê di pêncsaliya xwe de dest bi stranbêjî û çîrokbêjiyê dike. Ew stran û çîrokên xwe di civatan de dibêje û gelekî bala guhdaran dikişîne. Piştî demekê ew li gundê Hemiteyê û li gundên der û dorê bi navê Aşiq Kemal tê bi nav kirin. Aşiq Kemal, bi aşiqên din re -mîna Aşiq Alî ku ew paşê wî dike yek ji qehremanên romana xwe ya bi navê Dara Hinarê-davêjin ber hev. Aşiq Alî jê re dibêje, ger ew bi zaroktiya xwe evqasî jîr be, gava ew mezin bibe ew ê bibe mîna Karacaoglan. Karacaoglanê biçûk gava ji Wanê koç dikin û li Hemiteyê bi cih dibin, di serjêkirina qurbanan de, gava mêrê metika wî pez digurêne, kêra wî dişemite û li çavê Yaşêr dikeve. Ew roj ev roj e Yaşar Kemal bi çavekî dijî.

Yaşar Kemalê surgunbûyî, ji bavê sêwî, bi çavekî û nexwendî li gundê Hemiteyê û li gundên dorhêlê mîna cinekî ye, jîr e, bi kêrî xwe tê, xwe zû dixe çavên xelkê û xwe dide hezkirin. Li gundê wan kesî ku bi xwendin û nivîsandinê bizanibin nîne. Hemû nexwendî ne û dibistan jî'li gund tuneye. Yaşar Kemal cara pêşî di heşyt saliya xwe de nivîsê bi riya etarekî dibîne. Rojekê etarek

tê gundê wan. Yaşarê bi meraq dibîne ku etar bi pênûsekê tiştekî li defterê dinivîsîne. Yaşar Kemal ji etêr dipirse bê ew çi ye. Etar jî jê re dibêje, ku ew deynê gundiyan dinivîsîne û ji bo ku ew ji bîr neke, paşê wan dixwîne û bi wî awayî dikare deynê xwe ji nava gundiyan bide hev. Ew tiştê ha gelekî bala Yaşar Kemal dikişîne. Ew tavilê têdigihîje ku ger ew hînî wê nivîsandinê bibe ew ê bikaribe bi riya nivîsandinê stran, şiîr, çîrok û destanên xwe binivîsîne û bi wê yekê ew ê bikaribe bi hêsanî bi bîr bîne.

Piştî wê bûyera etêr ew dixwaze zû hînî nivîsandinê bibe. Lê dibistan li gundê wan tuneye. Ji bo xwendinê divê ew biçe gundekî din. Ger ew bikaribe xwe bigihîne gundekî din jî, ji ber nebûna peran, ji ber feqîriyê ew ê nikaribe dibistanê bixwîne. Yaşar Kemal ji xwe re soz dide ku ew ê herî dirêj di hundurê sê mehan de hînî nivîsandinê bibe. Ew berê xwe dide gundê Burhanliyê. Diçe ba mamosta û dibêje, ez dixwazim bixwînim. Mamosta li vî xortikê nehsalî yê bi çavekî dinihêre, li kinc û qerpalên lê dinihêre û bawer nake ku ew ê bikaribe bi wî awayî tu xwendinê bike. Yaşar Kemalê ku bûye evîndarê xwendinê, li ber mamosta digere û sozê didê ku ew ê di hundurê sê mehan de hînî nivîsandinê bibe. Û bi rastî jî piştî xwendina sê mehan êdî Yaşar Kemal dest bi xwendina rojnameyan dike. Ew êdî bûye gurekî xwendinê. Ew li ku çav li çi dikeve, dixwîne, çi tê bîrê dinivîsîne. Gava

10

ew sinifa pêncan xelas dike, dixwaze xwendina xwe bidomîne. Lê dibistana navîn li gund tunebû. Di wê navê de wan mal bar kiribûn Edenê û di xaniyekî xerabeyî de diman. Yaşar Kemal di bin şerdên zehmet de li Edenê dest bi xwendinê dike. Ew ji ber bêîmkaniyê di sala 1939an de mecbûr dimîne ku dibistana navîn

di sinifa dawî de nîvcî bihêle.
Êdî Yaşar Kemal xortik e, divê ew bixebite û alîkariya apê xwe û diya xwe bike. Çi kar dikeve ber wî ew dike. Ew ji tevrikê, ji hevdana pembo, ji paletî û şifêrtiya traktorê bigire heta bekçîtiya nava erdan dike. Lê di her karî de jî dîsan ew li stran û destanên xwe difikire. Ew difikire û dinivîsîne. Dinivîsîne û dixwaze bi xelkê bide xwendin...
Di salên 1941-1942an de Yaşar Kemal li gundê bi navê Baxçe ku nêzîkî gundê Hemiteyê ye dibe alîkarê mamosta. Paşê rola mamostetiyê digire. Ew mîna mamosta jî gelekî jîr e. Xwendevanên xwe bi huner û edebiyatê perwerde dike. Ji wan re stran û dengbêjan tîne, di sinifê de bi wan dide gotin û bi wê yekê şagirtên wî bêhawe kêfxweş dibin û bi qasî wê kêfxweşiyê bi mamosteyê xwe ve têne girêdan. Herweha Yaşar Kemal bi şagirtên xwe komeke tiyatroyê ava dike û şagitan dikişîne nava cîhana tiyatroyê jî. Lê ji ber ku meyla wî li ser edebiyat û nivîsandinê ye, ew dibe aboneyên gelek kovaran û kovar jê re têne dibistanê. Ew dibe xwendevanekî baş û paşê dixwaze bibe nivîskarekî baş. Ew dest pê dike hêdî hêdî şiîrên xwe ji kovaran re dişîne û şiîrên wî di kovaran de tên weşandin. Gava ew cara pêşî di kovarê de çav li navê xwe dikeve, ew bêhawe dilşa dibe û ew dilşahiya wî dike ku ew heta îro jî dev ji nivîskariyê, dev ji êş û xweşiyên nivîskariyê bernede. Ew li Edenê di kovarên mîna "Göruşler", "Çig", "Kovan", "Olkii", "Millet" û "Başpinar" de şiîrên xwe belav dike. Di wê navê de jî ew li gundan digere, çîrok û destanên ku ji
ii
gundiyan dibihîze, di deftera xwe de dinivîsîne û paşê li ser wan dixebite.

Di wan salan de jî ew li Edenê ji xwe re deqtîloyekê peyda dike
û dibe "erzûhalcî". Yanî ew bi perê xwe ji xelkê re erzûhalan dinivîsîne.
Bi riya nivîsandina erzûhalan ew xelkê wir, kul û derdên
wan, êş û azarên wan, cîhana wan ya hundurî baştir nas dike
û ew yeka ha di pêş de dibe çavkaniyên romanên wî yên bingehîn.
Yaşar Kemal piraniya gernasên xwe ji wan mirovan hildibijêre
û serpêhatiya wan ji nû ve dinivîsîne.
Her wê demê ew li Edenê Arif û Abidîn Dîno nas dike. Arif û
Abidîn Dîno di jiyana Tirkiyeyê ya edebî û hunerî de du navên
girîng bûn. Herdu bira wê demê ji aliyê karbidestan hatibûn
surgunkirin û li Edenê dijiyan. Herçiqas hevnaskirina Yaşar Kemal
û herdu biran bi tesadufî be jî, lê dostaniya wan heta dawiya
jiyana herdu biran dom dike. Hevnaskirina Yaşar Kemal ya bi
Arif û Abidîn Dîno re, dibe destpêka jiyaneke nû. Wî ê êdî jiyana
gundîtiyê li dû xwe bihişta û bi riya Stembolê bibûya nivîskarekî
cîhanî. Êdî Edene ji Yaşar Kemal re teng tê, ew dixwaze biçe
Stembolê. Lê ew li Stembolê kesî nas nake, tu navnîşanên wî, tu
dostên wî yên nêzîk nînin. Abidîn û jina xwe Guzîn Dîno navnîşana
Azra Erhat didinê. Piraniya nivîskar û wergerên ku li
Stembolê bûn, nas û dostên Abidîn û Guzînê bûn. Yaşar Kemal
li Stembolê diçe ba Azra Erhat. Ji wê re behsa herdu dostên wê û
jiyana wan ya li surgunê dike. Pêşî tiştek ji vî xortê bi qelafetê
gundiyan nakeve serê Azrayê, lê paşê ew li wî û li fikir û fantaziyên
wî ecêbmayî dimîne. Azra wî dibe mala xwe û pê re li ser ziman
û edebiyatê, li ser edebiyata devkî û kulturên cihê sohbet dike.
Yaşar Kemal, li Babialiyê, di rojnameya Cumhuriyetê de dibe
xwedî kar. Karbidestên rojnameyê ji bo jîrîtiya Yaşar Kemal û ji
x%

bo ku ew bi kurdî dizane ji bo roportajan wî dişîne Diyarbekirê.
Yaşar Kemal ji Diyarbekirê jî derbasî Wanê dibe û diçe gundê
zaroktiya xwe, nava merivên xwe. Gava merivên wî çav li wî dikevin
li ser serê wî kom dibin û bi hemêz û maçîkirinan vî xortê
jêhatî dilşa dikin. Ew li wir li ser jiyana kurdan, li ser şertên zehmet
yên jiyanê ji rojnameya Cumuhuriyetê re roportajan dişîne.
Lê ji ber ku rojname nakeve destên wî ew nizane ka gelo roportajên
wî têne weşandin an na. Lê haya wî jê nîne ku roportajên
wî li Stembolê deng didin û herkes vî navê nû meraq dikin. Gava
Yaşar Kemal bi xwe cara pêşî çav li roportajên xwe dikeve, gelekî
kêfa wî tê, radihêje rojnameyê û baz dide dereke xalî û dixwîne.
Ew di roportajên xwe de êş û zehmetiyên ku xelk dikişînin û
jiyana kurdan ya zehmet î di şikeftan de tîne zimên.
Rojnameya Cumuhuriyetê ji bo roportajên wî pereyekî baş didiyê
û êdî deriyê şansê li ber vedibe û roj bi roj ber bi pêş ve diçe.
Piştî roportajên Kurdistanê ku bi navê roportajên "Rohilatê"
dihate bi nav kirin, Yaşar Kemal vedigere Stembolê. Ew di wê
navê de jî çîrokên xwe diweşîne. Projeya nivîsandina ince Memed
jî wê demê dest pê dibe. Gava Yaşar Kemal di sala 1953an
de nivîsandina romana ince Memed xelas dike pêşêkêşî berpirsiyarê
Cumhuriyetê yê wê demê Cevat Fehmi Başkut dike, Cevat
Fehmi Başkut radihêje romanê û datîne dera hanê. Ew naxwîne
jî, ew bawer nake ku wê ev "rohilatî" bikaribe romanekê binivîsîne.
Gava piştî çend rojan Yaşar Kemal diçe ba wî û jê dipirse
bê ka gelo wî roman xwendiye an na, Cevat Fehmi dibêje, ku wî
hê xelas nekiriye, bi tenê nîvê wê xwendiye. Yaşar Kemal dibêje,
ez bawer nakim ku te nîvê wê xwendibe, dibêje, ger te dest pê kiribe
tu ê nikaribî dev jê berdî, divê tu wê xelas bikî. Berpirsiyarê

Cumuhuriyetê li bixwebaweriya vî ciwanî ecêbmayî dimîne û bi rastî jî gava dest bi xwendina wê dike nikare dev jê berde, heta
13
destê sibehê dixwîne û bêhawe jê hez dike.
Lê Yaşar Kemal ew romana xwe bêtir ji bo peran nivîsandibû. Roman pêşî di rojnameya Cumhuriyetê de tê weşandin, paşê jî mîna du cildan derdikeve. Derdikeve û li seranserî Tirkiyeyê deng dide. Yaşar Kemalê rojnamevan êdî dibe romannivîs. Dibe romannivîs û dibe romannivîsê herî baş. Dibe romannivîsê herî baş û navê wî hêdî hêdî sînorên Tirkiyeyê derbas dike. Ew romana wî ji bilî navdariyê jê re gelek peran jî tîne. Rewşa wî ya aborî bi carekê ve tê guhertin û ew dibe yek ji nivîskarên Tirkiyeyê yê herî halxweş. Di anketên kovar û rojnameyên Tirkiyeyê de Yaşar Kemal dibe yek ji nivîskarên ku herî pir tê xwendin. Ew tam di wan salan de di meydana navneteweyî de dibe navekî girîng û gelek kovar û rojnameyên fransiz û îngilîzan nivîsên pesintijî ji bo wî dinivîsînin. ince Memed di sala 1957an de werdigere zimanê bulgarî, di 1959an de wedigere zimanê rûsî, di 61ê de li îngîltere û Amerîkayê bi îngilîzî derdikeve. Di 62an de jî ew bi zimanê almanî û bi spanyolî derdikeve. Hema çi bigire ji bilî zimanê kurdî ew bi hemû zimanên dinyayê yên mezin hate weşandin. Pir bi derengî be jî ew wergeriyaye zaravayê soranî jî.
Di sala 1964an de şîrketa 20th Century Fox dixwaze Ince Memed bike fîlm, lê karbidestên Tirkiyeyê ji bo kişandina fîlm destûrê nadin ku ew li Tirkiyeyê were kişandin, fîlm ji mecbûrî li Yugoslavyayê tê kişandin.
Yaşar Kemal ji ber neheqiyên civatê, ji ber berberiya sinifan û ji ber birçîbûn û nedemokratîkbûna Tirkiyeyê, cihê xwe di nav

çepan de digire. Di wan salan de piraniya kurdên hişyar jî di nava çepan de bûn. Yaşar Kemal dikeve Partiya Karkerên Tirkiyeyê. Ji xwe ew serokê Partiyê Mehmet Ali Aybar ji salên xwe yên eskeriyê nas dike, dostê wî yê nêzîk e. Hingî piraniya kurdan jî cihê xwe di nava vê partiyê de digirin. Ji ber ku ev partî hem ji

14

bo demokratîzekirina Trikiyeyê têdikoşa hem jî li gorî partiyên din li ser pirsgirêka kurdan radiwestiya. Lê ji ber vê nêrîna Yaşar Kemal dewlet dev jê bernade, dide dû û gelek caran wî digirin û tade û neheqiyên nedîtî lê dikin.

Edî navê Yaşar Kemal navekî girîng e. Ew hem rojnamêvan e, hem çep e, hem jî nivîskar e. Piştî romana ince Memed dikeve nava hewildanên derxistina kovaran. Bi Fethi Naci re kovara bi navê "Ant" derdixin. Paşê bê rawestan romanên xwe dinivîsîne. Teneke, ölmez Otu, Agrt Dagt Efsanesi, Yer Demir Gök Bakir, Kimsecik, Yilam öldurseler, Kale Kaptst.Yusufçuk Yusuf, Kuşlarda Gitti û bi dehan çîrok û romanên din... Gelek ji çîrok û romanên wî bi temamî li ser stran û destanên kurdî ava bûne, çavkaniya gelek çîrok û romanên wî dîsan stran û destanên kurdî ne û di gelek çîrok û romanên wî de tîpên kurdî yên erînî hene. Yaşar Kemal di vî warî de yekemîn nivîskarê zimanê tirkî ye ku kurdan bi awayekî erînî dide nîşandan. Romanên wî ji aliyê jina wî Thilda ve tavilê dihatin wergerandin û bi wê yekê deriyê cîhanîbûnê lê vedibû. Bi riya wergerên Thildayê yên îngilîzî ew werdigeriyan zimanên din ên cîhanê. îro çi bigire romanên Yaşar Kemal wergeriyane hemû zimanên dinyayê yên muhîm. Wî hem di qada Tirkiyeyê de hem jî di qada navneteweyî de bêhejmar nîşan û xelat girtine.

Di salên heştêyî de gava em hatibûn Swêdê navê pêşî ku me dibihîst navê Yaşar Kemal bû. Herkesî, hemû xwendevanên Swêdê Yaşar Kemal nas dikirin. Çi bigire herkesî ince Memed xwendibû, hekesî jê hez kiribû. Navê wî ji salên heyştêyî û bi vir de di akademiya Swêdê de ji bo xelata Nobelê aktuel e. Lê heta niha jî ew nebûye xwediyê xelata Nobelê. Ew nebûye xwediyê xelata Nobelê ya edebiyatê lê bi dehan bi xelatên mezin yên çi neteweyî û çi jî navneteweyî hatiye xelatkirin.

15

Ji ber nenivîsandina wî ya bi kurdî herçiqasî em jê dilşikestî bûbin jî, me dîsan xwest em jî bi vê wergera Mustafa Aydogan ya rewan wî xelat bikin, careke din wî bi zimanê dayika wî ve bikin yek û zimanê zaroktiya wî careke din di bîra wî de bînin. Em bi pêşkêşkirina vê berhema ku gêrik zimanê xwe bi destê fîlan ve bernadin, hêvî dikin ku daxwaza gelê kurd a di warê xwestina zimanê xwe de xurttir bibe û pêşdetir biçe.

FiratCewerî

Stockholm, 1998

16

YEK

Fîl digirin ser welatên gêrîkan, bajarên wan hildiweşinin û wan dikin hêsîr.

Siltanê Fîlan, fîlekî ku ji kevokeke spî spîtir, gir û bi heybet bû. Li ser textê xwe rûniştibû û li bende qasidê xwe bû. Di her tevgera wî de, xuya dibû ku ew nikarîbû di cîhê xwe de rawestiya.

Piştî kurte-demekê, Serkumikê Berz ew qasidê ku Siltan li bendê bû, hat. Ev çûkê ha, Serokê hudhudan bû. Xuya bû

ku baskên wî yên fireh, res û spî westiyabûn. Rengê kumika wî ya dirêj a ku li ser serê wî û li dora situyê wî, wek kevanekê bilind bûbû, turuncî bû. Perîkên wî bi turunciyekî wek şewqa tavê dibiriqand. Perîkên sînga wî yên tenik û zirav jî pitik pitikî bûn.

Piştî ku sê caran di ser serê Siltanê Fîlan re firiya û sê xelekên turuncî çêkirin, çû xwe li ser guliyê dara ku li ber bêvila Siltên bû, danî.

Siltanê Fîlan bi lez got:

- Tu bi xêr û bi selamet hatiyî... Ka bibêje... Bibêje, çi xeberên gêrîkan hene, ma te ji min re tu mizgîniyeke xêrê anîye?

Serkumikê Berz pir westiya bû. Baskên xwe tam çar caran vezelandin û li hevdu xistin. Bi lihevduxistina baskên wî re, pelên guliyê dara çinarê yê ku ew li ser bû, kil bûn.

17

Serkumikê Berz got:

- Bila tu sax bî, Siltanê min. Tu her hebî, Siltanê min.

Min ji welatên gêrîkan deng û behsên xweş anîne. Ez tam heft mehan li welatê wan mam. Ji min re gelekî qenc bûn. Bi xwarin û vexwarineke bêqusûr, dostanî û mazûbanîyeke pir baş nîşanî min dan. Min di vê dinyayê de mexlûqên weha ne dîtine.

Siltanê Fîlan boriya:

- Ev mexlûqin çawa ne? Min qet gêrîk nedîtine.

Serkumikê Berz baskên xwe sê caran vekirin û got:

- Tiştên pir piçûk in. Ew mexlûqin ewqas piçûk in ku tu pir ji nêzîk ve li gêrîkekî nenihêrî, tu ê nikaribî wî bibînî.

Siltanê Fîlan got:

- Ka behs bike, behsa hunerên wan mexlûqên piçûk bike. Mezinbûn an piçûkbûna wan ji min re ne lazim e. Lê hunerên wan lazim in.
Serkumikê Berz êdî westandina ji ber rêwîtiyê, ji ser xwe avêtibû û bêhna wî hatibû ber wî.
Got:
- Siltanê min î delal, çavê min, tu îcar bala xwe bide hunerên gêrîkan.
Serkumikê Berz dest pê kir. Her ku wî digot, Siltanê Fîlan ji kêfa, ji ser hişê xwe diçû. Ji ser hişê xwe diçû û bê rawestan, pirs li dû pirsê ji Serkumikê Berz dikir.
- Bajarin ava kirine, qet ne pirse Siltanê min, di bin erdê de... Bajarin medenî, bi heybet. Embarên wan sal duwanzdeh meh heta ber dev bi xwarin, hunguv, navika kulîlkan, zad û kêzikên mirî ve dagirtîne. Paytextên xwe tam di orta deştên fireh de ava kirine. Ev deşt ji peravên Nîlê jî ji Çûkûrovayê jî hîn bi berekettir in. Tew deştek heye, welatek heye ku ew qas bi bereket e, tu fîlan lê biçînî dê şîn bibin.
18
Aliyê baktlr ê vî welatî hemû daristan e. Daristaneke weha ye ku piling têkevê nema dikare ji nav derkêve. Aliyê başûr jî sal duwanzdeh meh tev şînkayî ye. Desteke fireh û heta çav çavan dibire rast û sal duwanzdeh meh heta ber dev bi kulîlkan ve dagirtl.* Rojhilatê wê zevî, rojavayê wê zevî, tu can lê biçînî, tu çûkan lê biçînî, tu gêrîkan lê biçîriî dê şîn bibin.
Her ku Serkumikê Berz digot, ji kêfa difuriya û her ku difilriya digot, Şev û rojekê t>ê rawestan ji Siltanê Fîlan re behsa gêrîkan, bajarên wan, welatên wan kir. Siltanê Fîlan jî xwe

wenda kiribû û li vî çûkê ku ji kêfa difuriya guhdarî dikir.
Serkumikê BefZ dît ku Siltanê Fîlan ji fiişka ve çeng bû ser
piyan û kir qêrîn.
- Hemû filên min, bicivin!
Ji dengê wî yê bilind çiya hejiyan.
Fîlan dest pê kir û civiyan. Heta ji welatên dûr jî hatin. Civandina
waii sê roj û sê şevan ajot.
Gava ku hema hema hemû fîl civiyan> Siltên ji Serkumikê
Berz re got:
- Bipeyive! Behsa hunerên gêrîkên bi qasî ku çavên me nikarin
wan bibînin pir piçûk in, bike.
Serkumikê Berz baskên xwe li hevdu xistin û firiya. Di ser
koma fîlan re fireh fireh firiya, xelekên turuncî çêkirin û dest
bi gotinê kir. Her ku wî digot fîl rnest dibûn, av bi devê wan
diket û girêza wan diherikî.
Di dawiyê de, Siltan derket ser bêfzana gir. Textê wî yê fireh
û kevin li wê derê vegirtîbû. Li ser textê xwe mexel bû û
pirsî:
- We bihîst, we hunerên gêrîkan bihîstin?
Wan got:
- Me bihîst.
Siltên got:
- Fîlek, fîlek bi tenê, belkî bi qasî çend milyar gêrîkan me-
19
zme.
Û ji Serkumikê Berz jî pirsî:
- Ma ne weha ye?
Serkumikê Berz:

- Dibe ku hîn jî zêdetir.
Siltên got:
- Hûn ji bo vê meseleyê çi dibêjin, hûn çi dibêjin?
Wan got:
- Em ê çi bibêjin, Siltanê me hertiştî baştir dizane.
- Ger weha be, de heydê em herin ser welatê gêrîkan. Bilezînin...
Siltan di herî pêşiyê de, tam li ser serê wî Serokê hudhudan
Serkumikê Berz difiriya, li dû wî jî artêşa fîlan bi rê ketin.
Serkumikê Berz ji Siltên pirsî:
- Ma tu dibêje, ez bangî hudhudên xwe jî nekim? Dibe ku
alîkariyeke artêşa me jî bigihêje me.
Siltên got:
- Gidî, tu çi sekinîyî, birayê min î Serkumik, zû bangî wan
jî bike. Alîkariya wan ê bigihêje me, çi gotin e. Bêyî artêşa
hudhudan, bêyî wan hudhudên xwediyên baskên sivik û kumikên
turuncî, ez li vê dinyayê dikarim çi bikim... Zû bangî
wan bike, ez wan hemuyan dixwazim.
Serkumikê Berz firiya û got:
- Dibe, ez ê a nuha, heta bîstikekê hemuyan bînim, Tu
her hebî, Siltanê min. Rêya te vekirîbe. Bila sefera me ya ser
gêrîkan bi serkevtinê biqede.
Siltan qêriya:
- Dê bi serkevtinê biqede!
Hemû fîlan jî ev gotinên wî dubare kirin.
Piştî bîstikekê, ezman bi dengên şelpîna baskan hat dagirtin.
Ewrekî ku ji hudhudan, ji baskên belek û ji serkumikan
20
pêkhatî, ser serên filan girt. Ezman nexuya bû.

Serkumikê Berz bang kir:
- Sefêra me ya li ser gêrîkan dê bi serkevtinê biqede.
Hemû hudhud û fîlan jî mîna wî, bi dengê wî re bang kir.
Bi kêfxweşî rêya xwe didomand. Her ku artêşa fîlan pê li erdê dikir, dinya dihejiya. Tam li hember wan li jorê, hudhud bask bi bask, di ewrekî turuncî yê rengîn de dibiriqîn û difiriyan. Li jêrê, fîlan xwe kil dikir û zik bi zik dimeşiyan. Guhên wan ên mezin her ji bîstekê carekê jî mîna merşan vedibûn.
0 Siltanê Fîlan spîboz, biriqandî, şuştî û veşuştî bi tena serê xwe di pêşiyê de dimeşiya. Serokê hudhudan dostê wî yê kevin Serkumikê Berz jî bihustekê li ser serê wî difiriya. Ew û Siltanê Fîlan dipeyivîn. Siltanê Fîlan ê pir jîr û fenek kûr difikirî. Di van gêrîkan de gelek feyde hebûn. Piştî ku li dinyayê ew qas gêrîk hebin, ma dibû ku mirov weha bijî? Ma Xwedê ji bo çi gêrîk ew qas pir çêkirine? Bê guman dê sebebek hebûya ku gêrîk ew qas pir hatine çêkirin. Li gora gotinên Serokê hudhudan Serkumikê Berz ê serpêhatî, kevir û kuçik hemû gêrîk bûn û gêrîk ew qas pir dixebitîn, bajarên ew qas xweşik ava dikirin, ew qas pir xwarin hiltanîn ku...
Bê guman dê ji van hemuyan re sebebek hebe. Gava Siltanê Fîlan dimeşiya, ji xwe re weha difikitî û ji ber ku wî ev gêrîk berê di xortaniya xwe de nas nekiribûn, li ber diket. Zemanekî pir hêja wenda kiribû. Xortaniya wî, hemû jiyana fîlan di nav bêîmkaniyan de heder bûbû. Lê ma li vê dinyayê fîl, van fîlên pir mezin û bi heybet divê weha bûna, weha di tengasiyê de bijiyana? Lê Siltan dê çi bike, çi bûye hey bûye. Diviyabû mirov zemanê ji nuha û pê ve baş bi kar bianiya.

Piştî qonaxa sê rojan, Serkumikê Berz got:
- Em gîhaştin welatê gêrîkan Siltanê min.
Siltên pirsî:
21
- Ka kî der e?
Serkumikê Berz:
- Tu vê deştê dibînî Siltanê min, ev deşta fireh ku bi qasî deryayeke mezin xwe digihîne deverên ku êdî çav çavan nema dibîne, ji serî heta binî welatê gêrîkan e. Di orta vê deştê de çiyayek heye. Li pişt wî çiyayî jî welatekî ji vî welatî firehtir... Ev welat jî welatê gêrîkên din e. Li pist wî jî welatên din...
Berê xwe bi rojhilat vekir, daristana ku heta çav çavan dibire dirêj dibû nîşan da. Berê xwe bi rojava vekir, mêrga ku heta ber dev bi kulîlkên bişkivî ve dagirtî nîşan da. Berê xwe bi bakur, bi başûr vekir, çiya, gol, kulîlk û dar nîşan dan. Fîl rawestiyabûn û bi awayekî bi heyran li vî welatê vit î vala, xweşik û rohnî temaşe dikir.
Siltanê Fîlan bang kin
- Amade bibin!
Fîl ketin rewşa amadebûnê.
- Hebekî li jor binihêre!
Fîlan hemuyan bi hevdu re xortimên xwe ber bi jorê ve bilind kirin.
- A va, yê li jorê li ser serê we difire Serkumikê Berz e. Ew rêberê we ye. Ew ê di pêşiya we de bifire û bajarên gêrîkan nîşanî we bide. Hun ê heta ku ew teslîm bibin, heta ku kevir li ser kevirî nemîne, bajarên gêrîkan hilweşînin. Piştî ku teslîm

bûn jî bila bên huzûra min û xwe biavêjin min. Leşkerên min, fîlên min ez careke din dubare dikim, heta ku gêrîk nebêjin çîz, hûn ê li hêsirên çavên wan nenihêrin. Serleşkerên min, ez ji we re dibêjim; hûn ê fîlê ku dilê wî piçekî jî bi gêrîkan bişewite, bikujin. Dilên leşkerên fîlan bi kesî naşewitin. Leşkerên fîlan ji bo paraztina dewleta fîlan a herî dawiyê, êşê nêzîkî dilên xwe jî nakin. Fîlno, birayên min, ev şerê we yê mezin î yekem e. Ger em di vî şerî de bi ser kevin, em ê

22

bibin zalên dinyayê. Fîlno, birayên min, hemû mexlûqên dinyayê û dîrok rawestiyane û li me û li vî şerê me yê pîroz temaşe dikin. Ger em îroj serên gêrîkan netewînin, hemû mexlûqên dinyayê û dîrok dê me efu nekin. Dîrok dê serkevtina me ya îroj, bi herfên zêrînî binivîsîne. Fîlan di vî serê îroj de, serkevtin heq kiriye. Ji ber ku fîl bi îhtîşam in, ji ber ku fîl bi esil in, ji ber ku fîl jêhatî ne. Dîroka fîlan a çil sed salî li wê derê, li ezmên rawestiyaye û li me dinihêre.

Ger em di vî şerê îroj de, li hember gêrîkên ku dijminatiya me dikin û êrîşî welatê me dikin, tam bi ser nekevin, dîrok, dîroka fîlan dê me qet efil neke. Filno, birayên min, leşkerên min, ger em di vî şerê îroj de, li hember gêrîkan têk biçin, ev gêrîkên ku dixwazin xwîna me vexwin, dê yekî jî ji me nehêlin. Ew ê me hemuyan bixwin. Nesilê filan dê ji ser ruyê dinyayê rabe. Ji ber vê yekê, fîlno, birayên min, leşkerên min, divê em di vî şerê îroj de bi ser kevin û li welatê gêrîkan kevir li ser kevirî û tu benderuhan nehêlin.

Siltanê Fîlan rabû ser lingên xwe yên dawiyê, herdu lingên xwe yên pêşiyê ji hevdu vekirin, xortima xwe dirêj kir û weha

peyivî. Li hember gêrîkan halan di fîlan de hilda û di hundurê her fîlekî de agirekî heyfhilanînê yê bêsînor pê xist. 0 di bin rêberiya Serokê hudhudan de pênc sed fîl, pênc sed dêwên kujek, pênc sed xezeb, mîna pênc sed bivirên tûj dibiriqand û xwe bera ser bajarê gêrîkan da.
Şerekî pir giran li dar ket. Gêrîkên sor, reş, zerî, siwarî di bin lingên fîlan de tev welatên xwe, bajarên xwe bi erdê re bûn yelc Şerekî bi qasî ku di çarçoveya gotina şerekî pir giran de hilnayê hat kirin, ket dîroka fîlîtiyê. 0 di dîroka fîlan a şer de, destana herî mezin hat nivîsîn.
Hawar û gazî bi derbekê re di ezmên re derketin. Moraneke hilweşandinê, dûmaneke mirinê ji nişka ve girt ser welatên gêrîkan. Roj li nîvroj, ji toz û dûmanê, çav çavî nema di-
23
dît. Gava roj çû ava, hejmara gêrîkên li welatan daketibû nêvî. Gêrîkên ku reviyabûn xelas bûbûn û yên ku nikaribû bireviyana jî hatibûn pelçiqandin.
Siltanê Fîlan li dûr rawestiyabû, li meydana şer temase dikir û dipesinî li şerê ku fîlan dimeşand, dinihêrî. Toz û dûmana li ser welatên gêrîkan her ku diçû bêtir dibû.
Siltên bangî Serokê hudhudan kir û got:
- Çi bû? Ger ev deverên ku xuya dibin welatên gêrîkan bin, ger tiştên ku ez dibînim rast bin, hemû welat bi erdê re bûn yek. Ew ji bo çi hîn jî nabêjin çîz? A, ez li vê ecêbmayî dimînim.
Di ruyê wî de tirs û taswasek xuya bû.
Serkumikê Berz got:
- Ez di bextê de me, Siltanê min, ez di bextê te de me, Siltanê

min, çîz çi gotin e, ji kerema xwe re, xwe daqûl bike û
lê binihêre, bi hezaran gêrîk ji gava ku şer dest pê kiriye û vir
de, heta hîn berî ku şer dest pê bike, bi hezaran gêrîk ji bo
ku tu wan efu bikî, xwe avêtine lingên te... Ji kerema xwe re
xwe daqûl bike û li wan binihêre.
Siltanê Fîlan got:
- Ez nabînim.
Serkumikê Berz got:
- Ew pir piçûçik in. Her yek ji wan bi qasî serê derziyê ye.
Fîlek nikare ew qas ji dûr ve wan bibîne.
Siltanê Fîlan got:
- Baş e, min dengê wan jî seh nekir.
Serkumikê Berz:
- Dengê wan pir zirav e. Baş bû ku te dengê wan seh nekir.
Ger te seh bikira, dilê te dê bi wan bişewitiya... Weha
digirîyan, weha lavelav dikirin ku ya sitar, yê ku dilê wî hebûya,
nikarîbû îdare bikira. Tevî ku ez çivîk bûm, tevî ku ez
mexlûqekî li ser dinyayê, li derveyî dinyayê dijiyam jî, gava
24
wan bi dengekî şewat li ser kuştiyên xwe digotin, min bi xwe
jî nikarîbû îdare bikira. Dilê min ji êşê peritî. Te qet, te qet
îdare nedikir, Siltanê min, te qet! Baş bû ku te hawar û gaziya
wan nebihîst ... Leşkerên te jî gava ew diavêjin ser kuştiyên
xwe, dengên wan nabihîsin, xwîna wan a diherike û serên
wan ên tên jêkirin nabînin... Baş e ku nabînin, ji ber vê
yekê, dikarin şer weha bê merhamet bidomînin. Li vî ezmanî
binihêre, li çivîkên min binihêre, Siltanê min, ma qet tu ji
wan di ser welatên gêrîkan re difire? Ma tu dil dikare li hember

vê rewşa gêrîkan, vê hilweşandina bajarên wan îdare bike, ma dilê ku dil be, dikare xwe li ber ragire?
Siltên got:
- îdare nake. Baş e ku em nabihîsin û nabînin.
- Ji xwe, ger hemû mexlûqan şer bidîta, bibîhista, hemû mexlûqan bikarîba qêrînên şer bibîhistana, li vê dinyayê şer çênedibû. Ji ber ku kirêtiya şer nayê zanîn... Ji ber ku xerabiya şer tê veşartin, hemû mexlûq vî şerî qebûl dikin.
Siltên got:
- Hela gêrîkan li ser baskên xwe bike û bîne, ez wan bibînim. Ez ê bi wan re bipeyivim. Heyfbû, me baş nekir ku me bajarên hemû welatan hilweşandin.
Serkumikê Berz got:
- Na, ne heyf bû. Ji ber ku gêrîkan bas fahm kir, bê ftl kî ne, careke din heta qiyametê, nema dikarin li hember fîlan serî rakin. Ji bo gêrîkên pelçiqîn jî serê xwe neêşîne. Li vê dinyayê, ew qas pir welatên gêrîkan, ew qas pir gêrîk hene ku em nikarin wan bi mejiyê elektronîk jî bihejmêrin, em nikarin wan ne bi pelçiqandinê û ne jî bi kuştinê biqedînin...
Siltên got:
- Baş bû ku weha bû. Nuha jî hela ka van gêrîkan li ser baskên xwe bike û bîne, ez ê bi wan re bipeyivim. Ez ê lê binihêrim, em ê lê binihêrin bê ev gêrîk çi teba ne.
15
Serkumikê Berz daket ber lingên Siltên, li wê derê gêrîk bi ser hev de dixulxulîn û diqêriyan.
Serkumikê Berz bang kir:
- Dengê xwe mekin.

Gava gêrîk çav li dostê xwe yê kevin Serkumikê Berz ketin, kêfa wan ew qas hat, ew qas hat ku nayê gotin. Lorînên ser kuştiyên xwe, nifir û qêrînên xwe rawestandin û bi kêf bang kir.
Gêrîkan ji Serkumikê Berz re got:
- Tu di roja me ya teng de, baş di hawara me de hat. Wekî din jî tu bi zimanê fîlan dizanî, rêyekê bibîne û me bigihîne Siltên.
Serkumikê Berz got:
- Ez jî ji bo vê yekê hatim ba we. Siltan we dixwaze. Li baskên min siwar bibin.
Berê Gêrîkê Rîhsor li baskên Serkumikê Berz siwar bû. Bi dû wî re jî yên din, mezinên gêrîkan pir perîşan li ser pişt û baskên Serkumikê Berz civiyan.
Serkumikê Berz firiya, li dora serê Siltên sê caran zîvirî. Sê xelekên turuncî yên şewq dida, mîna taceke zêrînî di ser serê Siltên de biriqîn. Dû re jî hat û xwe li ser serê xortuma Siltên danî.
Siltên emir da:
- Xwe li devereke hîn nêziktir deyne. Ez nikarim van tiştên piçûçik bibînim. Navê wan gêrîk e, çi ye?
Serokê hudhudan baskên xwe li hevdu xistin, xwe li devereke tam binya çavên Siltên danî û got:
- Gêrîk.
Siltên ji kêfa kir wîrqînî:
- Min ew dîtin! Ma gêrîk ev in, ev ên ku bi qasî serê derzîyê ne?
Serkumikê Berz got:

26
- Ev in. Tew ev ên ku li ser baskên min, mezintirînên gêrîkan in, pêşevanên wan in.
Siltanê Fîlan şaş ma:
- Hella hella! Hella hella! Ev çi mesele ye, ev mexlûqin çawa ne ku her yek ji vana dinya li pişta xwe kiriye? Ma rast e?
Serkumikê Berz got:
- Rast e, her gêrîkek dikare dinyayekê, heta fîlekî bi pişta xwe hilgire.
Siltan dîsa ji kêfa qêriya:
- Ez dengên wan jî dibihîsim.
Siltên guhên xwe yên wek merşan baş vekirin û got:
- Dengê wan çi ecêb e. Ji dengê vizîniyekê ziravtir e, ne weha? Çi dibêjin? Gotinên wan wek ku ew dibêjin, ji bo min wergerîne û yên min jî ji bo wan.
Serkumikê Berz:
- Li ser serê min, ez ê gotinên wan, wek ku ew dibêjin wergerînim. Li baskê min binihêre.
- Min lê nihêrî.
- Gêrîkê ku li ser serê vî baskê min rabûye ser lingan, Rîhsoro ye. Ji serî heta binî di nav xwînê de maye.
Siltanê Fîlan got:
- Ez dibînim.
Serkumikê Berz got:
- Ew hesinkerek e.
Siltanê Fîlan ecêbmayî ma.
- Ne xwe, ne xwe, hesinkerê gêrîkan jî heye!
Serkumikê Berz got:

- Heye. Li dinyayê çi qas meslek hebin, hemû li ba gêrîkan jî hene. Di nav hemû mexlûqan de mîmar û mihendisên herî baş, ji nav gêrîkan derdikevin. Tê gotin ku di nav mexlûqan de, hesinkerên yekem jî gêrîk bûn. Siltanê min, sulala vî yê Rîhsor ji gava ku dinya hatiye avakirin û vir de

27

hesinker e. Ew jî Siltanê hesinkeran e. Dibêje ku fîlan bîstikeke berê, dikana wî ya hesinkeriyê bi ser serê wî de hilweşandiye, lingê wî yê rastê di bin dîwêr de maye û jê bûye.

Siltên got:

- Wax wax, ez li ber ketim ku lingê yê Hesinker jê bûye. Lê ger milê wî jê bûbûya?

Rihsorê di nav xwînê de mabû, bang kir:

- Wê gavê mirin dê bastir bûya. Hesinkerê ku milê wî jê bibe, mirî tê hesibandin.

Siltên dilê xwe bi Rîhsorê ku di nav xwînê de mabû şewitand û got:

- Mirî tê hesabkirin.

Rîhsoro bang kir:

- Dilê te ji bo çi bi min dişewite?

Siltên got:

- Ez li ber dikevim ku hesinkerek ketiye vî halî. Ger gêrîk be jî gava lingê hesinkerekî jê bibe, ez li ber dikevim.

Rîhsoro tev êşa canê xwe, xwe li hember Siltên zivir kir û peyivî:

- Me çi bi te kiribû, me çi bi te kiribû ey Siltanê siltanan? Me çi bi te kiribû ku te em xistin vî halî? Li hember binihêre bê welatên gêrîkan di çi halî de ne, bibîne, bibîne ku ji berdêla

ew dilê te yê kevirî dê bi min biêşe, bila bi van welatên dinyayê ên herî xweş ku hatine hilweşandin û şewitandin, biêşe.
Gava ku Serkumikê Berz peyv di devê xwe de dimilmiland û di wergera gotinên Rîhsoro de zehmetî dikişand, Siltanê Fîlan bang kir:
- Tu dê gotinên vî yê Kulek eyn wek ku ew dibêje, ji min re wergerîne. Ger tu xwe di ser gotineke re çeng bikî, ez ê bi baskên te bigirim û te bikim du şeqan.
0 Serkumikê Berz gotinên Rîhsoro ji Siltên re wek ku di-
28
hat gotin wergerandin.
Siltanê Fîlan lingên xwe yê rastê bi hêrs li erdê xist, çermê wî yê spîboz ji hêrsa spîsor bû û bû qirçe qirça qîlên wî:
- Ma min, ma fîlan êrîşî we kir? Ma tu dîn î, Hesinkero? Neteweyê fîlan tu carî êrîşî tu neteweyan nake. Neteweyê fîlan aştîxwaz e, xebatkar e, egîd e. Ji bo çi ew ê bê sebeb êrîşî welatê gêrîkan bike? Tu divê vêya baş bizanîbî Serokê hesinkeran ku em, fîl bi tenê xwe diparêzin. Tu ji ber êsê, ji ber ku lingê te jê bûye, vê êrîşê dike sûcê fîlan. Ev hilweşandin, toz û dûmana ku em li hember dibînin, ne êrîşa me ye, lê ya we gêrîkan e. Hemû dinya vê weha dizane. Êrîşa yekem ji gêrîkan hat, we, gêrîkan malên me û bajarên me bi ser serên me de hilweşandin. A, we bersiva xwe jî stend. Belê, belê we stend. We fîlên aştîxwaz anîn xezebê. Gava fîl hatin xezebê jî va, we dît bê çi qewimî. Ji ber ku hûn bi xwe û bi pirbûna xwe zêde bawer bûn, we êrîşî welatê fîlan kir. We bi temamî pê li qanûna mexlûqên yekbûyî kir. Fîl hindikayiyê û hûn jî

piraniyê pêk tînin. Lê divê we bizanîba ku hindikayiya biheq
ji piraniya bêheq xurttir e.
Siltanê Fîlan rawestiya, hilma xwe stend, piştî ku xortima
xwe bi vir de û wê de kil kir, got:
- We bi êrîşa xwe ya ser welatê fîlan, çewtîtiyeke mezin
kir. Binihêre, hûn jî bi awayê herî giran hatin cezakirin.
Ne zimanê Rîhsoro û ne jî yên gêrîkên din digeriya, Peyv
ji wan çênedibû. Bi tenê, carinan ji devê wan ev gotin derdiketin:
- Ma me, ma me êrîşî fîlan kir, ma me?
Ewqas.
Di dawiyê de, zimanê Rîhsorê ku devê wî zuha bûbû, geriya:
- Em çawa dikarin êrîşî fîlên weha qerase ku bi qasî Xwedê
mezin in, bikin Siltanê min?
29
- Hûn bi piraniya xwe bawer bûn û we êrîşî fîlan kir.
- Me êrîş nekir.
Siltan qêriya:
- Çi? Tew, tew li hember gotinên min derdikeve! Serkumikê
Berz, wan ji ser pişta xwe biavêje ber lingên min...
Serkumikê Berz li ber geriya û got:
- Ez di bextê te de me Siltanê min, ez di bextê te de me
Siltanê min, gotinên wan çewt hat fahmkirin. Wan tiştekî
din got.
Siltên bang kin
-Wa?Wa?
Ji ber dengê wî, erd, daristan, ezman û çiya wek ku zelzele
li wan rabûbe hejiyan.
Di serî de Gêrîkê Kulek û dû re yên din got:

- Gotinên me şaş hatin fahmkirin. Me êrîşî fîlan kir, me
malên wan bi ser serên wan de hilweşandin. Me fîl hemû pelçiqandin
û kuştin, ancax piştî wê fîl jî hêrs bûn û ketin welatê
me. Aaax, xwezî me ew neanîna xezebê.
Siltên bang kir:
- Hih, nuha bû.
Yên din soz da û got:
- Me di te de kir, tu di me de neke, Siltanê me. Careke
din tu gêrîk dê pê li erdê welatê fîlan neke.
Siltên bang kin
- Ew ê pê lê bike!
Ji dengê wî ezman qelişî.
Gêrîkan dubare kir:
- Ew ê pê lê bikê.
- Ew ê bi çavên xerab li welatê fîlan nenihêrin.
Gêrîkan dubare kir:
- Em ê bi çavên xerab lê nenihêrin.
Ji nuha û pê ve, gêrîk dê dev ji êrîşên xwe yên ku di hemû
30
demên dîrokê de dikir, berdin. Ew ê qet tu careke din, bi çavên
xerab li welatên fîlan nenihêrin.
Gêrîkan bang kir:
- Ew ê qet, qet nenihêrin.
- Gêrîk dê heta qiyametê, dev ji wan adetên xwe yên êrîşker
berdin.
Gêrîkan peyva wî tesdîq kir û got:
- Ew ê dev jê berdin.
Piştî demekê bêdengiyeke mezin çêbû. Ne gêrîk û ne jî SUtanê

Fîlan peyivî. Ji welatên gêrîkan dengên qêrîn, qelebalixî, girî û nalînan dihatin. Ezmanê welatê gêrîkan bi dûmaneke gûr û sor ku mîna dûmana şewatê bû, hatibû nbcumandin. Yên li wê derê, demekê weha li ser rewşa welêt daxil bûn.
- Siltanê me, me di te de kir, tu di me de neke. Lê binihêre, ger şer weha dewam bike, li welatê me dê gêrîkek bi tenê jî nemîne. Pirraniya wan dê bimirin, birîndar bibin, hin ji wan jî dê xwe li çiya û daristanan bigrin û li hemberî we dest bi şer bikin.
Siltanê Fîlan bi awayekî ecêbmayî pirsî:
- Ew ê dest bi şer bikin? Gêrîk dê li hember fîlan dest bi şer bikin?
Rîhsoro got:
- Ew ê dest bi şer bikin.
- Ne xwe, gêrîk dê li hember fîlan dest bi şer bikin! Ev ê çawa çêbibe?
- Ew ê rêyekê jê re peyda bikin.
- Çawa?
- Ez çi dizanim, qey ew ê rêyekê jê re peyda bikin.
Siltên dubare kir:
- Ew ê rêyekê jê re peyda bikin. Wa, ew ê rêyekê jê re peyda bikin, ha?
Siltên dest bi ken kir. Bi zikê xwe girt, ji xortuma wî girêz
3i
diherikî û dikeniya. Fikra ku gêrîk ê li hember wan dest bi şer bikin û ew ê xwe li daristan û çiyayan bigrin û vî şerî bidomînin, pê pir heneko hatibû. Bê rawestan dikeniya. Mirov dikarîbû tehamula hertiştî bikira, lê ev ken nedihat îdarekirin.

Rîhsoro hertişt da ber çavên xwe û peyivî:
- Em ê heyfa van welatan û vê şikenandinê hilînin, hey Siltanê zalim, hey Siltanê bêmejî, hey Siltanê gêj. Em ê vêya ji te re nehêlin, heeey yê ku ji serî heta binî de, di nav xwînê de dakirî, tu heeey çiyayê zilmê yê kor î zirecêb. Ev tiştê ku te lciriye, dê ne ji te re û ne jî ji wî Serkumikê Berz ê kal re bimîne... Di demeke pir nêzîk de, tu ê ji wan gêrîkên piçûçik ên ku bi qasî serê derziyê piçûçik bela xwe bibîne û li hember hemû mexlûqên dinyayê rezîl bibe, tu ê rezîl û riswa bibe...
Rîhsoro weha got, xwe ji ser baskên Serkumikê Berz avêt erdê û reviya. Piştî ku ew çû, pertavên gêrîkên din ketin avê û sist bûn. Bi awayekî nedîtî xwe avêtin Siltên:
- Tu çi emir bikî, em ê bikin, Siltanê me. Bes bila ev şerê bi xwîn raweste. Wî gêrîkê ku tu hêrs kirî, wî Rîhsorê Kulek ê Hesinker bîstikeke berê xwe ji vê derê çeng kir jêrê.
Siltan ket taswasê û got:
- Ma mir? Wa, ma gava gêrîk xwe ji devereke weha bilind biavêjin erdê dimirin? Ger ne miribe, ez wî a nuha, mirî an jî bi saxî dixwazim.
Serkumikê Berz ji jor ve bi tirs xwe bera xwarê da. Wî fahm kiribû, bê Siltan çi dixwaze. Dest bi lêgerandina Rîhsoro kir. Gêrîkan bangî gêrîkên din, Serkumikê Berz jî bangî çivîkên din kir, li her deverê geriyan, lê wan Rîhsoro ne bi saxî peyda kir û ne jî bi mirîtî. Bêhn û berata gêrîkê birîndar ê ku di nav xwînê de mabû, tune bû. Çawa kirin, çi kirin jî, çi qas lê geriyan û pirsîn jî dîsa li piça şopa Hesinkerê Kulek
32

rast nehatin. Li ser pişta Serkumikê Berz bi awayekî destvala û sûcdar, dîsa derketin huzûra Siltên û got:
- Me Rîhsoro peyda nekir, bû toz û ji erdê hilat. Gava mexlûqek xwe ji ser pişta Serkumikê Berz, ji devereke ew qas bilind biavêje erdê, ma qet tu xêr tê de dimîne, ma wenda nabe, Siltanê me.
Serkumikê Berz got:
- Wenda bûye çûye.
Siltên ferman da:
- Hun ê heta qiyametê, li toza wî Rîhsorî jî bigerin. Mayina toza wî jî, ez ji we re dibêjim, li min guhdarî bikin gêrîkno, ji bo gêrîkan mirin e. Hun ê li şopa wî nemerdî, wî bêbavî, wî kûçikî... herroj, hertim bigerin.
Gêrîkan got:
- Em ê lê bigerin. Ew mirin e, ew zilm e. Ew Gêrîkê Kulek ji xwe ji berê de belaya serê neteweyê gêrîkan e. Ew nemerd e, hatiye firotin, cahş e. Ew Gêrîkê Kulek ji xwe, ji ber cahşiya xwe ji lingekî xwe bû.
Ma li ser Gêrîkê Kulek çi gotin çi ne gotin. Li vê dinyayê dê bêhna toza wî xayinî jî nemaba. Gêrîkên milahîm dê toza wî şeytanê serî hildaye, piç bi piç peyda bikira û ji ortê rakira. Gêrîkên milahîm dê ji nesilê Kuleko gêrîkek jî nehistiba.
Siltên got:
- Yên ku dinyayê tev li hevdu dikin, yên fîlan dicixirîne û welatê we hildiweşînin, ev hesinkerên kulek in, ev ên rîhsor in, ev xayin in.
Gêrîkên din bang kir:
- Bila hesinkerên kulek bimirin!

- Bila rîhsor bimirin!
- Bila hesinker bimirin!
- Nuha, hûn çi ji min dixwazin, bbcwazin.
- Em saxiya te dixwazin, Siltanê me.
33
- Tu feydeya saxiya min, ji we re tune ye. Daxwaza xwe bibêjin.
Gêrîkan got:
- Wê gavê, bila ev şer raweste. Daxwaza me ev e.
- Haaa, ev?
Gêrîkan got:
- Ev e. Ji ber ku fîlên aştîxwaz ji şer hez nakin.
Siltanê Fîlan got:
- Em jê hez nakin.
Gêrîkan got:
- Me dersa xwe stend, em jî bûn astîxwaz. Careke din êrîşî welatê fîlan kirin, ya sitar, Xwedê neke. Bila ev şer a nuha raweste, ger hebekî din dom bike, gêrîkek bi tenê jî dê nemîne.
Me efu bike, Siltanê me.
Siltên xortima xwe ber bi ezmên ve bi serbilindî tam rep kir û got:
- Êdî bila şer raweste.
Gêrîkan kêfa xwe anî û got:
- Bila tu sax bî, Siltanê me.
Siltên got:
- Lê ji bo rawestandina şer, hin şertên min hene. Ji ber ku we dest bi vî şerî kir û we gelek zerar da welatê fîlan. Ji bo vê, hûn ê zerara welatê min bidin.

Gêrîkan got:
- Em ê bidin.
- Wê gavê, nuha li daxwazên min guhdarî bikin...
- Bila ev şer a nuha raweste, Siltanê min.
- Şertên min qebûl bikin.
- Em ê qebûl bikin. Ger şer hebekî din jî dom bike, li ser ruyê dinyayê gêrîkek jî namîne ku em bikaribin daxwazên te pêk bînin... Kerem bike, daxwazên xwe bibêje, daxwazên te li ser serê me ne.
34
Siltan e ev, kêfa wî hat.
Got:
- Wê gavê li min guhdarî bikin. Hun ê hemû gêrîk bicivin û ji min re serayeke krîstal ava bikin. Seraya krîstal dê li serê vî çiyayê bilind bê avakirin, divê ji aliyê dinyayê yê din ve jî bê dîtin. Ev seray dê ew qas bi şewq be ku ji ber şewqa wê, dinya mîna ku roj qet neçûbe ava, bi şev jî rohnî be. Hezar, du hezar, sê hezar fîl dê têkevin hundurê wê, lê ev seray dê neyê xwarê.
Gêrîkan dest bi gazindan kin
- Em gêrîkên pir pir piçûçik in. Lê em pir pir piçûçik in. Em ew qas piçûçik in ku heywanên din me ji mexlûqan jî nahesibînin. Em ê serayeke weha çawa ava bikin?
- Hûn ê hem jî di maweya salekê de ava bikin.
- Em di bextê de ne, Siltanê me...
- Bext mext tune ye, hûn ê ava bikin.
- Tu dibînî ku Siltanê me, bê em çi qas zeîf in, em çi qas jî piçûçik in.

Hemû bi hevdu re li ser baskê Silêmanê Dunikil, bê rawestan li ber Siltanê Fîlan geriyan, gazind kirin, hêsirên dilşewat barandin, lê nikarîbû rehmek têxista dilê Siltên ê kevirî.
Siltanê Fîlan bang kir:
- Nabe, nabe! A, ev qet nabe. Şerm e, weha gazindan nekin û li ber min negerin. Ev bi gêrîktiya we nakeve. Min bihîst ku hûn mexlûqên pir xurt in.
- Lê serayeke weha di salekê de....
Siltan keniya û got:
- Hûn ê ava bikin. Hûn ê ava bikin. Behsa we ji min re hatiye kirin, her yek ji we dikare bi qasî sê qatî giraniya xwe, pênc qatî giraniya xwe, deh qatî giraniya xwe bar hilgire.
- Rast e, Siltanê me lê...
- Hûn ê çêbikin... Neteweyê gêrîkan li vê dinyayê bi qasî
35
axe pire...
- Pir e, Siltanê me, lê di salekê de...
Siltan ji nişka ve di xezebeke bêsînor de sorîkur bû. Bû çîrke çîrka qîlên wî yên dirêj û bang kir. Gêrîk ji vî dengî ew qas tirsiyan ku got qey dinya bi ser serên wan de hilweşiya.
- Hûn ê çêbikin, çêbikin! Hûn li vê dinyayê, neteweyê herî xurt in.
Gêrîk li ser baskê Silêmanê Dunikil lerizîn.
- Em ê çêbikin, çêbikin, lê... Di salekê de tew serayeke krîstal, em ne gêrîk, lê em mirov bin jî em nikarin çêbikin. Me efu bike, Siltanê me.
Siltanê Fîlan bi serbilindî got:
- Hûn ê çêbikin. Hûn ê çêbikin, hûn ê hem li serê vî çiyayî

serayeke krîstal ava bikin, hem jî embarên wê, kîlerên wê
bi hunguv, rûn, îksîr, her celeb xwarin û ava heyatê dagirin.
Hem jî hem jî di hundurê salekê de. Hem jî hûn ê ji min re,
ji Siltanê xwe re almas, durr, yaqût û zimrûdên herî mezin
ên dinyayê bînin. Ez xezîneyan ji we dixwazim, xezîneyan...
Hun li vê dinyayê hemû deverên bin erdê û cîhê defîneyan
nas dikin. Karê we, bajarên we bi piranî di bin erdê de ne. Ji
ber vê yekê, hûn ê ji min re hemû zêr û defîneyên kaînatê bînin.
- Em di bextê te de ne, Siltanê me...
Siltanê Fîlan ew rawestandin û got:
- Bext mext tune ye. Ez li tu tiştî guhdarî nakim. Hûn li
vê dinyayê mexlûqên ku nesilê wan herî pir in. Hûn bi qasî
axê pir in. Bila ev Serokê hudhudan ê bi navûdeng şahid be,
ger hûn tiştên ku ez dibêjim, tavilê pêk neînin, tavilê dest bi
pêkanînê nekin, hem jî van karan di hundurê salekê de neqedînin,
ev şer dê raneweste. Madem hûn gêrîkên piçûçik
in, wê gavê we ji bo çi êrîşî welatê bav û kalan ê fîlên zirecêb
kir û welatê me şewitand û hilweşand? Ger hûn tistên ku ez
36
dixwazim, di hundurê salekê de, bi temamî pêk neînin û teslîmî
min nelcin, bila Xwedê şahidê min be ku dê ne li ser ruyê
erdê û ne jî li bin erdê gêrîkek bimîne, nesilê gêrîkan dê ji
vê dinyayê rabe. Hûn ê di bin lingên fîlên min û leşkerên
min ên girs de bipelçiqin, bipelçiqin.
Gêiîkên li ser pişta Silêmanê Dunikil dest bi girî kir û bû
zûre zûra wan:
- Em ê di maweya salekê de, çawa bikaribin van lcaran hemuyan
pêk bînin.

Siltan dîsa lê sor bû û got:
- Hûn ê çêbikin, çêbikin. Dev ji girî berdin û bi lez dest bi kar bikin.
Gêrîk kelogirî bûn û got, Serkumikê Berz jî gotinên wan bi eynî dengî wergerandin.
Gêrîkan digot:
- Siltanê me, Siltanê me yê bilind, muhteşem, payebilind, bi hêz û dilovan. Gava her fîlek pê li erdê dike, bi milyaran gêrîkan dikuje, ger tu pêşî li wan negirî, ger tu a nuha, berî ku deqîqeyek jî di ser re derbas bibe, vî şerî ranewestînî, tu ê ji bo avakirina seraya xwe nilcaribî ne gêrîk, ne mêşekê, ne mêşeke gêrîkan jî peyda bikî. Tu şerê fîlan rawestîne, em ê biçin vê pirsê di komcivîna gêrîkan de munaqeşe bilcin û bigihêjin encamekê. Ger em bibêjin, em nikarin çêbikin, wê gavê hertişt di destê we de ye, hûn ê ji nû ve dest bi şer bikin û me hemuyan bikujin.
Siltên got:
- Bila, bila ez ê şer, a nuha rawestînim. Her karkerekî min, yanî gêrîkekî min berberî dinyayê ye. Ji bo Xwedê bila gêrîkelcî min bi tenê jî nemire! Gava nenûka yekî jî di ber kevir keve, dilê min dê biperite. Ji nuha û pê ve, ez nahêlim gêrîkek jî bimire. Yê ku destê xwe bi gêrîkelcî min bike, ez ê wî bipelçîqînim. Kî, kîjan mexlûq destê xwe ber bi gêrîkên min
37
bibe, ez ê mala wî bişewitînim.
Siltanê Fîlan ji kêfa difuriya. Piştî ku ev gêrîk hebûn, êdî ser erdê jî bin erdê jî bûbûn ên wî. Di hundurê xwe de, pir li ber diket ku ji bo çi heta nuha gêrîk nehatibûn bîra wî. Ji

ber vê yekê, dikir ax û wax. Heta nuha, dê serayên wan ên
muhteşem hebûna, fîlan dê destên xwe di ava sar û germ danekiribûna.
Devê wan di çiçik de û qûna wan jî di kuçik de
dê bi embaran xwarina wan, bi sindoqan zêr, almas, zimrûd,
yeşîm û yaqûtên wan hebûna. Ax ax aaax!
Siltan bi helûbelekê bi ser hudhudan de boriya:
- Zû, zû xeberê bigihînin fîlên ku welatê gêrîkan hildiweşîne,
bila zû, a nuha rawestin. Bila a nuha rawestin, hem jî
dest bi alîkariya dermankirina birînên gêrîkên birîndar bi-
Icin. Hûn jî alîkariya wan bilcin, birînên gêrîkên me derman
bikin. Gêrîkekî min bi tenê berberî dinyayê ye.
Gêrîlcan bi hevdu re dest pê kir:
- Em di bextê de ne, Siltanê me, em di bextê te de ne, Padîşahê
me bila ew alîkariya me nekin, bila ew bi şûn de vekişin
û biçin, besî me ye. Bila fîl jî bi mebesta alîkariyê, bi her
pêlêkirinekê sed hezarekî ji me nekujin. Em di bextê te de
ne, Siltanê me, ev fîl dê bi mebesta alîkariyê, me hemuyan bi
nizanî bikujin. Hudhud jî dê me hemuyan bixwin.
Siltan:
- Wê gavê, bila fîl destên xwe qet nedin tu tiştî, ji welatê
gêrîkan vekişin û biçin daristanê. Bila li wê derê, qûnên xwe
di daran de bidin û bixurînin. Bila darên daristanê jî jê ne-
Icin, min ew daristan û deryaya li jêrê dan gêrîkên ku lcarkerên
min in. De hudhudno, bi lez têkevin rê.
Hudhud firiyabûn, tam gava ku ji Siltanê Fîlan bi dûr ketibûn,
bi dengekî ku erş û ezman dihejandin, veciniqîn:
- Bi şûn de werin!
Hudhud tevî gêrîkên li ser pişta xwe, tavilê bi şûn de firi-

yan.
- Komcivîn divê tavilê çêbibe. Divê hûn heta êvarî, encama komcivînê bigihînin min. Ez li vê derê li benda encama komcivînê mim. De herin, bilezînin.
Hudhud tevî gêrîkên li ser pişta xwe hatin welatê gêrîkan. Hatin, lê çi bibînin, ji toz û dûmanê, ne bajar xuya bûn, ne fîl xuya bûn û ne jî daristana mezin a li wê dorê xuya bû. Ji tozê, ezman jî ne xuya bû. Bi tenê şer û xircireke mezin hebû, dengê şer û xircirê ji perê deryayê, ji aliyê dinyayê yê din ve jî dihat bihîstin.
Hudhudan dest pê kir û bi dengê bilind, emirê Siltên ji fîlan re got. Bi hêrs bang kir, ketin heta hundurê guhên fîlên ku di nav toz û dûmanê de mabûn û bi hemû hêza dengê xwe ve, ji wan re emirê Siltên got. Tevî vê jî nikarîbû tu tişt bi fîlên hatibûn xezebê, bida fahmkirin. Wan ê nuha çi bikira, ger bîstikeke din jî derbas bibe, li welatê gêrîkan dê ne dareke çikandî, ne xaniyek, ne dîwarek, ne serayek û ne jî embarek bima. Li vê derê mexlûqekî ruhber bi tenê jî dê nemaba.
Dîsa tavilê firiyan çûn ba Siltên, ji wî re got ku Siltanê me, rewş ji vir heta vir e. Siltan e ev, ket taswasê, hêrsek bêsînor hatê û bi wê hêrsê tevî wî laşê xwe yê girs ber bi jor ve çeng bû û qêriya. Bi qêrîna wî re çiya û deşt hejiyan, dengê wî li dinyayê olan da. Gava fîlên hêrsbûyî yên ku şer û talanê ew zirdîn kiribûn, ev deng bihîst, bi derbekê re, li cîhê xwe rawestiyan û man.
Siltanê ku piştî bîstikekê aram bû, got:
- De biçin wê derê, heta ku hûn bigihêjin wê derê, fîlek bi

tenê jî nikare ji cîhê xwe tev bilive, biçin emirê min bigihînin wan.
Hudhud dîsa firiyan û xwe gîhand wan welatan. Toza ku ber bi ezmên ve hilkişiyabû, hêdî hêdî dadiket, fîl di nav tozê
39
de bi zorê xuya dibûn. Çivîk ji jor ve hêdî hêdî ber bi fîlan ve daketin û emirê Siltên ji wan re got. Fîl di nav xwêdanê, toz û heriyê de mabûn, ji hal de ketibûn. Tavilê ji welatên gêrîkan vekişiyan.
Nal nala welatan bû. Di bin lingên her fîlelcî de, komeke gêrîkên mirî, birîndar... Ew welatên delal ji deverên hatibûn şewitandin jî xerabtir bûn. Ne mûristaneke ku gêrikek bikaribe lê rûnê û ne rêyeke saxlem mabû. Mirov digot, qey wan rahistiye çiyayekî û bi ser van welatan de wergerandiye û çiya jî li vê derê, li ser serên van bajaran bela wela bûye. A, rewş tam weha bû. Li meydanê jî, ji derveyî birîndar û mirîyan tu gêrîk nexuya bû.
Serkumikê Berzê ku di xwîna gêrîkan de xemilî bû, got:
- Wax, wax! Tu gêrîkê saxlem nemaye. Hin ji wan mirî, hin ji wan birîndar. Ew welatê gêrîkan ê muhtesem nema, wax! Wax wax, heyfa gêrîkan, waaax!
Hudhudên din jî li ber vî bajarê ku demekê mîna nimûneyeke ji bihuştê bû, ketin. Ji çavên wan hêsirên germ herikîn.
Kî çav li halê vî bajarê şewitî û hilweşiyayî biketa, dê nikarîba xilolîkên xwe bigirtana.
Yek ji wan gêrîkên bbcwîn ên li ser pişta çivîkan bûn, bi hêrs û bi xemgînî peyivî:
- Bila Siltanê Fîlan îcar hilde xwe, bila bê hunerên xwe bibîne,

bila îcar seraya xwe bi gêrîkên kuştî bide avakirin, bila
îcar hemû xezîne û defîneyên dinyayê bi gêrîkên kuştî, bi
wan gêrîkên ku wî ew hemû dan kuştin, bide anîn.
Weha got û xwe ji jorê bera xwarê da û çû. Gêrîkên ku li
ser pişta çivîkan bûn, li hember vê rewşê xwe negirt û ji ser
baskan wek baranê hêsir barandin xwarê.
Piştî bîstikekê, dinya xêz û fêz bû, toz û dûman hêdî hêdî
belav bûn, bajar xuya bûn, ya sitar, mirov nikarîbû lê binihêriya.
40
Gava gêrîkên li ser pişta hudhudan, ev welatê ku hatiye şewitandin,
hilweşandin û tarûmarkirin dît, digot:
- Divê mirov tiştekî bike, divê mirov tiştelcî bike, divê mirov
li hember van filan tistekî bike.
0 ji derveyî vê gotinê tu tijtekî din nedigot. Lê ma gêrîkên
piçûçik dilcarîbû çi bi wan zirecêbên fîlan bilcira?
Hudhud ji ber firîna li ser welatê gêrîkan û dîtina vê hilweşandina
nedîtî westiyan, ji bo bêhnberdanê, tevî gêrîkên li
pişta xwe ber bi daristanê ve firiyan. Li welêt gêrîkek bi tenê
jî nemabû, wan ê ji Siltanê Fîlan re çi bigota? Li daristanê,
divê çivîk û gêrîk li hevdu rûniştana û hem bêhna xwe berda
û hem jî bifikiriyana... Ew ê ji xezeba Siltên çawa xelas bûbûna?
Gava Siltên bibîhista ku nesilê gêrîkan ji ortê rabûye û
li welêt gêrîkek bi tenê jî nemaye, wê gavê, ne hudhud û ne
jî gêrîkên li ser pişta wan dikarîbû ji destê wî xelas bûbûna.
Weha difikirîn û bi tirs berê xwe da daristanê. Gava wan nêzîlcî
li daristanê kir, lê nihêrî ku çi bibînin, aliyekî daristanê
reşîqîr, aliyek zer, alîyek jî sorîkur bûbû. Ji bo fahm bikin bê
ev çi ye, xwe gîhand daristanê. Haho ji bo Xwedê, her dareke

daristanê ji serî heta binî bi gêrîkan ve hatiye seyandin...
Gêrîkan ji tîrsa, xwe bi daran weha zeliqandibû ku mîna qaşilên daran hişk pê hatibûn seyandin. Gêrîkên reş li aliyê daristanê yê reşbûyî, yên zer li aliyê wê yê zerbûyî, yên mor li aliyê wê yê dûmana mor jê diçû, yên sor jî li deverên wê yê sorîkur bi ser hevdu de kom bûbûn. Daristan perçe perçe û rengareng bûbû, tu devereke şîn nexuya bû. Gêrîkên siwarî jî bi alîkariya lingên xwe yên dirêj û zirav dipekiyan, hildikişiyan ser hemû daran û dadiketin, û belasebeb vir de û wê de baz dida.... Daristan êdî ne darisran bû, gulokeke wek çiyayelcî ya ji gêrîkên ku tev digeriyan pêkhatî bû. Ser ruyê erdê, ezman bi temamî bûbû gêrîk, mirov ax biavêra, li erdê nediket. Hemû dinya ketibû ber xezeba tevgerekê. Bi milyaran
41
çav, di êş û xezeba çirûskekê de, bi şewqeke xurt dibiriqandin, bi milyaran rohnî bi hevdu re vêdiketin û bi hevdu re vedimirîn. Çîp, terî, laş li gewde, şax û pelên daran li hevdu geriyabûn û dixulxulîn.
Ew zirecêba daristanê di nav xwîn û nalînê de mabû û dixulxulî. Ji roja ku daristan bûye daristan û heta nuha, tevger û xirecireke weha nedîtibû.
Gava gêrîk ketin daristanê, hemû mexiûqên li daristanê, çivîk, kêzik, mar, jahrmar, rêvî, gur mîna ku ji êgir direviyan, ji wira baz dabû. Nuha li daristanê ji derveyî gêrîkan tu ruhberekî din tune bû.
Gêrîkên li pişta hudhudan li jêrê li wan gêrîkên ku mîna deryayê, vir de û wê de kil dibûn û tev de diçûn û dihatin nihêtî û weha fikirîn:

- Li vê dinyayê, li vî welatê me, ji texmîna ku me dikir jî bêtir gêrîk hene.
Gava wan vî welatê şewitî, gêrîkên mirî, birîndar dîtibûn, gotibû qey li dinyayê tu gêrîk nemaye. Ya rastî, dibe ku ji gêrîkên mirî û birîndar hezar- deh hezar caran bêtir gêrîk, ji welatan reviyane û xwe li daristanê girtiye.
Wan ji ser baskên hudhudan bi kêf bangî gêrîkan lcir:
- Şer rawestiya. Fîlan dev ji kuşrina me berda.
Wan ji ser baskên hudhudan ji gêrîkên li daristanê re gotinên hîn xweştir ku kêf û heyecaneke mezin çêdikir, digotin.
Dû re jî:
- Divê em hemû li orta daristanê bicivin, tiştên ku em ê ji hevdu re bibêjin hene. Siltên fêrmana kuştina me û şewitandina welatên me vê gavê sekinandin. Şertên wî yên giran hene.
Ger em wan bi cîh neynin, li ser ruyê erdê, tu gêrîk dê nemîne, koka wan ê biqelihe.
Kêfa gêrîkan li wan biliya û ew li orta daristanê li wê meydana ku bi qasî deştekê fireh bû, civiyan.
42
Gêrîkên li pijta hudhudan bêyî ku ji cîhê xwe dakevin, li ser serê deryaya gêrîkan a ku li meydanê tev de diçû û dihat geriyan û daxwazên Siltanê Fîlan gotih. Demeke dirêj tu ruhber ji cihê xwe tev ne liviya. Meydahê xwe bi destê bêdengiyê ve berdabû, bi temamî ker bûbû.
Gêrîkên li ser serê meydanê digeriyah ji wan pirsî:
- Belê, hûn çi dibêjin?
Tu gêrîkî jî nikarîbû serê xwe rakira û bersiva pirsên wan bida. Gêrîkên din jî li ser baskên hudhudan ên bi neqiş, li

ser meydahê digeriyan û bê rawestan dipirsî:
- Hûn çi dibêjin, çi dibêjin?
Ji nişka ve deryaya gêrîkan kil bû û qerêperêyekê dest pê kir. Qerepereyeke weha bû ku Siltanê Fîlah bi xwe jî ev dengê mîna girgira ewran bihîst û ji cîhê xwê guhên xwe bel kirin. Fermandarê Fîlan ê ku berî demekê ji welatê gêrîkan vegeriyabû ba Siltên, got:
- Siltanê min, gêrîk hemû civiyane û di hundurê daristanê de minakeseyê dikin. Ev deng ew e.
Siltan keniya û bi kêfgot:
- Bila minaqeşeyê bikin, ew ê di dawiyê de seraya min çêbikin û daxwazên min jî bi cîh bînin. Ez ê hîn jî hîn jî pirtir tisran bi wan bidim kirin.
Gêrîkan li wê meydana ku di orta daristanê de bû, sê roj û sê sevan bêyî ku bixwin, vexwin û rakevin minaqeşe kir, lê baş hûr bûn. Tê gihîştin ku tu çareya wan tune ye. Ew ê an daxwazên Siltên pêk bînin an jî bi ser hevdu de bêne kustin. Fîl xurt bûn, mezin bûn. Fîlek bi tenê, dibe ku bi qasî bi milyaran gêrîk bû. Ew ê çawa bikaribin li hember wan rabin û daxwazên wan pêk neynin.
Lê çend gotin hebûn ku ketibû devê gêrîkekî dilqecêb û wî hertim dipirsî:
43
- Ma qet tu çareya me, qet çareyek, qet qet çareyeke me tune ye? Ma tu hêza me ya ku em bikaribin li dijî fîlan şer bikin tune ye?
Deryaya gêrîkan a li wê meydana mezin, dengê xwe nedikir, xulxul û çûyin û hatin radiwestandin, difikirîn difikirîn

û dû re hemû bi hevdu re diqîriyan:
- Qet tu çareyeke me tune ye, tu çareyeke me tune ye...
Siltanê Fîlan ev qêrîna bêhêvîtiya gêrîkan, bi kêfdibihîst.
Gêrîkê dilqecêb di dawiyê de, ji ser baskê Silêmanê Dunikil
bangî yên li jêrê kir:
- Birano, çawa buya, ev bela dê bi ser me de bihau. Em
gelek salan, bi tenê bi jîrbûna xwe, bextiyariya xwe û welatên
xwe yên bextiyar pesînin û me ji derveyî vê tu tiştekî din nekir.
Gava em ew qas bextiyar dijiyan, ji bo ku belayeke weha
bi ser me de neyê, em li ru tedbîran nefikirîn. Halbûkî gelek
wextê me hebû, rojên ku em li ser pistê veketin çêbû. Me dikarîbû
ji bo pêşîlêgirtina belayên ku dê bi ser me de bên, serê
xwe biêşanda. Bê me çawa li hember lehî, baran, zîpik, berf
û zelzeleyan tedbîr stendibin, me dikarîbû li hember fîlan jî
çareyek peyda bikira. Ne bû, va em bûn kole, em bûn hêsîr.
Meydana mezin bi dengê wan hejiya:
- Em bûn hêsîr.
- Em ê ji nuha û pê ve, heta taliya dinyayê hêsîrên fîlan bimînin.
- Em ê êdî ji fîlan re seray, îbadetxane, gor û abîdeyan ava
bikin.
- Em ê êdî ji fîlan re durr, almas, yaqût, yesîm û zimrûdan
bînin...
- Em ê ji nuha û pê ve, ji fîlan re hemû xizne û defîneyên
ser û binê erdê bînin.
- Ji nuha û pê ve, li ser sifra fîlan mirov çi bixwaze dê hebe...
44
- Em ê bilcin û ew ê bixwin. Em ê bixebitin û xizan bimînin
û ew ê li ser piştê vekevin û dewlemend bibin.

Dengekî bêhêvî yê dirêj û dilşewat, ji vira û heta aliyê dinyayê yê din, pêl bi pêl belav dibû...
Komekê ji gêrîkan bang Icir:
- Mirin ji vê rewşê çêtir e.
Gêrîkê dilqecêb bi rik got:
- Divê çareyeke vêya hebe.
Deryaya gêrîkan kir qêrîn:
- Tu çareya me tune ye. Hela li xwe binihêre, li dilqê xwe binihêre, li vî halê xwe yê xerab binihêre... Ma qet te li xwe nenihêriyî, tu ji serî heta binî di nav xwîne de mayî.
Gêrîkê dilqecêb got:
- Fîlan sê lingên min jê kirin û rîh û simbêlên min ji kokê de rakirin.
Di nav gêrîkên siwarî de, yê herî kal jê re got:
- Hela dakeve jêr, ez ê birîna te derman bikim. Weha xuya ye ku tu ê di dawiyê de, ji me re lazim bibî. Ka dakeve ez birîna te rehet bikim.
Serkumikê Berz ew tavilê danî jêrê û got:
- A ji we re, hûn vî gêrîkê xwe yê biaqil çawa dikin bilcin, lê ger em tavilê xwe negihînin Siltên û xeberê nedinê, ew ê vê daristanê ji serî heta binî bişewitîne û li vê dinyayê gêrîkekî bi tenê jî nehêle. De zû, bilezînin.
Gêrîkê siwarî yê kal piştî ku merhem di şûna lingên jêkirî de da, devê xwe Icir guhê Gêrîkê dilqecêb û pirsî:
- Lo Gêrîkê dilqecêb, tu kî yî?
Gêrîkê dilqecêb bi tirs li der û dora xwe nihêrî û got:
- Ez, ez şagirtê Rîhsoro mim, di nav me de yê herî biaqil û herî egîd ew e.

Gêrîkê siwarî bi kêf û heyecan pirsî:
- Ew li ku ye?
45
Gêrîkê dilqecêb got:
- Ew reviyaye, nemiriye. Ew li ser baskê Silêmanê Dunikil bû, wî xwe ji wira avêt xwarê, reviya û xwe veşart. Ew nemiriye.
Gêrîkê siwarî got:
- Baş e. Baş e. Hema bila Rîhsoro bijî... Ew ê ji me re lazim bibe. Ew hevalê min e. Ew li vê dinyayê, Hesinkerê hoste yê herî mezin e. Ew hesinkerekî weha ye ku dikare ji hesinan gêrîkan çêbike û dû re ruh bide wan. Ya din jî, ew di nav yên bi rûkala dinyayê ketine de, yê herî mêrxas e, yê herî biaqil e, yê herî mervan e û yê herî dost e. Ger ew nebe, em ê vê serayê, van abîde, gor û embaran çawa çêbikin. Em ê welatê xwe yê wêranbûyî, bêyî aqil û zanebûna wî, çawa tamîr bikin? Baş bû ku nemir.
Gêrîkê dilqecêb got:
- Nemir.
Dû re got:
- Ax, aaax me çawa bîr nebir ku ev belaya fîlan dê bi ser me de bê, Rîhsoro çawa bîr nebir? Em ê nuha çi bilcin?
Gêrîkê siwarî got:
- Em ê çi bikin?
Gêrîkê dilqecêb mîna ku hinekan tiliya xwe di birîna wî de rakiribe, ji nişka ve çeng bû ser xwe, bêyî ku guh bide lingê xwe yê jêkirî, xwe çeng kir ser baskê Silêmanê Dunikil û xwe hişk bi perê baskê wî ve çirçirand:
- Ji bo Xwedê, em bilezînîn, birayê min î Hudhud, tu nemaye

tarî bikeve erdê. Gidî, ger em Siltanê Fîlan dîsa hêrs
bikin, ew ê li vê dinyayê gêrîkekî nehêle û koka me biqelihîne.
Em xwe zû bigihînê û jê re bibêjin ku em ê daxwazên wî
pêk bînin. Em jê re bibêjin da ku ew van fîlên xwe, van hilweşankeran
ji welatê me tavilê vekişîne.
Li ser van gotinên wî, hudhudan dest bi firê kir û piştî
46
bîstikekê jî gîhaştin ba Siltanê Fîlan.
Gêrîkê dilqecêb dest bi peyvê kir:
- Siltanê me, min ji te re mizgîniyeke xêrê ya herî xweş
anîye, gêrîk dê ji te re serayeke ku heta nuha li dinyayê nehatiye
dîtin, ava bikin. Tu wekî din jî çi bixwazî, ew ê pêk bînin.
Me mezinantiya te qebûl kir. Bin emiriya te, ji bo neteweyê
gêrîkan serefe.
Siltanê Fîlan ji kêfa bi zikê xwe girt Û keniya. Ew qas keniya,
ew qas keniya ku ji ber kenê wî çiya, daristan û welatê
gêrîkan heta demeke dirêj hejiyah.
Siltên ji yê Dilqecêb pirsî:
- Tu kî yî? Tu kî yî, lo qasidê biaqil, tu kî yî? Tu qasidekî
ew qas biaqil e ku ger tu ew qas he piçûk bûya û destê min
bigihîşta te, min ê destê xwe di milên te de bida û te pîroz
bikira. Min dixwest ku ez diyariyan bidim te, te bilind bikim,
te bi rûmet bikim û te bikim fîl.
Gêrîkê dilqecêb got:
- Ji min re dibêjin, Gêrîkê dilqecêb. Ez gêrîkekî weha
mim ku tu xusûsiyeteke min tune ye.
Siltanê Fîlan got:
-Ecêb.

Gêrîkê dilqecêb bi ken bersiv da:
- Belêêê, ecêb. Ma Siltanê min, min bîstikeke berê ne gotibû ku herkes ji min re dibêjin, Gêrîkê dilqecêb?
Siltanê Fîlan dîsa got:
- Ecêb. Ma qet tu xusûsiyeteke te tune ye?
Gêrîkê dilqecêb got:
- Ji derveyî ecêbiyê, na.
Siltanê Fîlan got:
- A, ez bi vêya kêfxwes bûm. Ne xwe, di nav gêrîkên nuh ên ku di bin emirê min de ne, yê ku tu xusûsiyeteke wî tune ye, tu yî... Lê, yên xwedî xusûsiyet Icî ne?
47
Gêrîkê dilqecêb got:
- Tu sax bî, tu her hebî. Xusûsiyeteke min bi tenê heye, ew jî ecêbiya min e, Siltanê min.
Siltanê Fîlan pistî ku piçekî fikirî, emir da wî:
- Ji nuha û pê ve, qasidê di orta min û gêrîkan de, dê tu bî.
Gêrîkê dilqecêb got:
- Ez nikarim, nikarim Siltanê min. Ez gêrîkekî seqet im, hem jî pir kal im. Ez êdî nema dikarim ji cîhê xwe tev bilivim.
Siltanê Fîlan pirsî:
- Ma xêr e, kîjan devera te seqet e, çi bi te hatiye?
- Gava fîlan welatê me hilweşand, lingên min jî ji kokê de jêkirin, Siltanê me. Ji ber ku Gêrîkê siwarî bîstikeke berê birînên min derman kirin û pêşî li xwînwendakirinê girt, ez gavê ji mirinê xelas bûm.
Siltanê Fîlan got:

- Wax wax, waaax, ez pir li ber ketim. Wê gavê tu ê ji berdêla xwe, gêrîkekî bi qasî xwe jîr û biaqil peyda bikî. Ger tu sedema vêya bipirsî, ew jî ev e ku ez ji ber çewtîtiyekê naxwazim hemû gêrîkên li ser ruyê erdê bikujim. Gêrîk ji nuha û pê ve, rohniya çavên me ne. Em neteweyekî weha ne ku dilê me bi hezkirina gêrîkan ve dagirtiye. Gêrîk êdî rohniya çavên me ne. Xwedê alî me lcir ku me ev gêrîk peyda kirin. Ji nuha û pê ve, li vê dinyayê, em tunebûnê nas nakin. A, ji ber vê sedemê, birêz Gêrîkê dilqecêb, tu ê ji min re gêrîkekî biaqil bibîne da ku ew wezîfeya xwe ya qasidiyê bi zanebûn pêk bîne.

Gêrîkê dilqecêb hîn ecêbtir bû û got:

- Li ser serê min, Siltanê min. Bi xatirê te Siltanê me.

Siltên ji wî re got:

- Oxir be ji te re, birayê min î Gêrîk ê biqail. Lê tu pir

48

ecêb e... Oxira te ya xêrê be, şêrê gêrîkan. Ji gêrîkan re bibêje ku bila ew bi lez dest bi lêkirina seraya min bikin. Ez êdî nema dikarim bêyî seraya krîstal îdare bikim. Ji nuha û pê ve, ez bi qasî ku Siltanê Fîlan, yanî Siltanê mexlûqên dinyayê yên herî girs im, ez Siltanê neteweyê herî qelebalix, Siltanê gêrîkan im jî.

Ji nişka ve rabû ser herdu lingên xwe yên dawiyê, herdu lingên xwe yên pêşiyê û xortima xwe kil kirin û axavtina xwe weha domand:

- Ma siltanên gêrîkên girs, gêrîkên mezin û gêrîkên bi esil, qet bê seray dibin?

Hemû mexlûq bi dengê wî veciniqîn. Ew jî peyivî peyivî,

bang kir û kêfxweş bû.
- Gêrîkên bi esiiiiil...
Hemû fîlên din jî bi hevdu re bang kir:
- Gêrîkên xweşik û bi esiiiiil...
Gava dengê kêfxweşiya fîlan zingînî ji dinyayê anî, Gêrîkê dilqecêb li ser baskê Silêmanê Dunikil hat welatê gêrîkan. Hat, lê dît ku gêrîkan bi lez dest bi tamîr û avakirina welêt kirine.
Serkumikê Berz hat xwe li pêşiya çarşiya hesinkeran danî. Gêrîkê dilqecêb hêdî hêdî ji ser baskê wî peya bû, bi dû wî re jî gêrîkên din peya bûn. Hîn lingên wan gihastibû negîhastibû erdê, gêrîkên li bajêr li dora wan civiyan û bi hêvî û meraq pirsî:
- Çi heye çi tune? Çi xeber heye, lo birayê ecêb?
Gêrîkê dilqecêb weha bersiv da:
- Dê çi hebe. Em mirin, neteweyê gêiîlcan êdî qediya. Neteweyê me yê ku di tu demên dîrokê de nehatibû hêsîrkirin, bû hêsîrê fîlan. Em bûn kole, kole. Aqilê min û dilê min ji min re dibêjin ku xwezî me şertên Siltanê Fîlan qebûl nekiribana... Bila me ew qebûl nekiribana û bila fîlan em hemû
49
bikuştana. Êdî heta qiyametê, em ê mîna kole û hêsîran bijîn. Gêrîkê Rîhsor jî êdî tune ye. Wî xwe ji ser baskê Silêmanê Dunikil avêt xwarê, destê xwe da ser serê xwe û çû. Dibe ku miribe. Ne dûr e ku tehamulî hêsîrtiyê nekiribe û xwe ji qehran kuştibe.
Gêrîkan hemuyan bi hevdu re bang kir:
- Rîhsoro nemiriye. Ew namire.

Gêrîkê dilqecêb hîn ecêbtir bû û got:
- Xwedê bike. Heta qiyametê mîna koleyên fîlan jiyîn...
Ma jiyaneke weha hêja ye ku mirov bijî?
Gêrîlcan got:
- Hêja ye, jiyan hêjayî hertiştî ye. Mirin bêhêvîtî ye, lê hêvî di jiyana herî xerab de jî herroj mîna kulîlka rojê vedibe.
Gêrîkê herî kal got:
- Dinya şêrîn e, Gêrîkê dilqecêb, Gêrîkê dilqecêb.
Dû re jî weha dewam Icir:
- Binihêre, her tiştên te, sê ling, rîh, simbêl, guh û bêvila te hatine jêkirin û çavelcî te hatiye derxistin û tu riq û rût maye, ma tu ji bo çi xwe nakujî? Jiyan şêrîn e, ne weha, ecêb lawê ecêban? Kûçikê bêhêvî. Ma fîlan tu fêrî vê bêhêvîtiyê kiriyî?
Gêrîkê dilqecêb bi himînî got:
- Ez dibêjim, hêsîrtî ji mirinê jî dijwartir e, hûn jî bela xwe di min de didin. Ma ka bêhêvîtî di kî dera vê peyvê de heye?
Gêrîkê kal got:
- Bêhêvîtî di mirinê de ye... Ji berdêla ku em ê xwe bikujin, em ê ser bikin û bimirin.
Gêrîkê dilqecêb got:
- Ez jî vêya dibêjim. Wê gavê, ji bo ku em xwe ji fîlan xelas bikin, divê em çareyekê peyda bikin.
Gêrîkê kal got:
- Ka raweste, sebir bike.
50
Gêrîkên din hemûyan bi hime him got:
- Çi çare heye ku dikare me ji destê fîlan xelas bike?

Gêrîkê kal got:
- Li peydakirina çareyekê gerîn, ji mirina bi ser hevdu de çêtir e. Ez bi xwe jî tu çareya ku bikaribe me ji destên fîlan xelas bike nabînim, lê...
Gêrîkekî ciwan bang lcir:
- Divê hebe. Bêguman dê rêyek hebe, divê hebe. Ger ew fîl bin jî divê neteweyê gêrîkan heta qiyametê nebe hêsîr û nabe hêsirê wan.
Hemû welatan ji serî heta binî, bi hevdu re bang kir.
-Nabe!
Gêrîkê dilqecêb bi tirs got:
- Rawestin, hêdî hêdî, weha bang nelcih. Ger fîl van gotinên me bibihîsin...
Tevahiya welêt bi hevdu re bang kir:
- Guhên fîlan giran in, ew nilcarin dengê me bibihîsin.
Gêrîkê dilqecêb bala wan kisand:
- Hudhud ê ji wan re bibêjin. Hudhud ketine bin emirê fîlan. Divê tu kes nebihîse, bê em çi dipeyivin...
Gêrîkên hemû welatan bi hevdu re bang kir:
-Divê nebihîse!
0 di guhên hevdu de got:
- Heta rizgariyê, heta rizgariyê, heta rizgariyê...
Peyva "heta rizgariyê" tavilê li hemû welatan geriya û dîsa li Gêrîkê dilqecêb vegeriya.
Gêrîkê dilqecêb û gêrîkên din ên ku ji ba Siltanê Fîlan vegeriyabûn, tavilê bi bazdan çûn alîkariya hevalên xwe yên ku bajar ji nû ve ava dikirin.
Çil roj û çil şevan xebitîn û paytext ji nû ve avalcir. Dû re jî

dest bi jinûveavakirina hemû welêt kir. Di demeke kurt de, welat jî ji nû ve hat ava kirin. Ji aliyekî ve jî li ser qotê çiyayê
5i
bilind, seraya Siltanê Fîlan bilind dibû. Piştî demekê, welatên wêranbûyî yên din jî birînên xwe derman kirin...
Û gêrîk bê rawestan ji bo ku ji bindestiya fîlan rizgar bibin, li rêyan digeriyan. Peyveke biaqil a ku li deverekê dihat gotin, bi awayê kurtepistê, ji nişka ve li hemû welatan digeriya û li wan vedigeriya.
Fîl pir mezin û gêrîk pir piçûk bûn. Lê çi qas çi qas jî piçûçik bûn...
Fîl pir mezin bûn, lê ma neteweyê gêrîkan nikarîbû heta qiyametê jî weha hêsîr, mîna koleyên fîlan bixebitiyana! Divê dawiya vî tiştî bihata, dê bihata.
Kengî tirs û bêhêvîtiyek bi gêrîkan re çêdibû, li hember wê, peyveke hêviyê mîna çirûskekê, li welatên gêrîkan tavilê belav dibû... Gêrîk dikarîbû bê nan û av û bê hewa bijiyana, lê nikarîbû bê hêvî bijiyana.
0 ji bo xelasbûna ji vê belayê, li welatê gêrîkan ji heftsaliyan heta heftêsaliyan hemû welatê gêrîkan difikirî. Wan dizanîbû ku ji vira heta ba Xwedê, aqil di ser êqil re ye.
Fîl mexlûqin pir xurt in, lê aqil ji wan jî pir xurttir e. Aqilê gêrîkên piçûk divê zora fîlên mezin ên îlahî bibe.
5*
DUDU
Siltanê Fîlan bi hudhudan re li hevdu dike û metodên birêvebirina gêrîkan peyda dike.
Silranê Fîlan bangî Serpkê hudhudan Serkumikê Berz kir

ûgot:
- Kerem bike, xwe li ser vî guliyê li ba min deyne. Karê min bi te heye, birayê min î Serkumikê Berz.
Serokê hudhudan hat, xwe li ser guliyê li ber bêvila Siltên danî û got:
- Her çi karê te hebe, li ser serê min.
Siltanê Fîlan got:
- Hûn ê hemû hudhud têkevin bin emirê min. Ji îro û pê ve, êdî bi rojan firîna li dû mêşekê, kêzikekê, mozekê qediya. Gêrîk çi qas mêş, kêzik, moz û xwarinên din ên ku hûn jê hez dikin bidin hev, hemû yên we ne. Neteweyê hudhudan dê mîna fîlan li ser piştê vekeve.
Serkumikê Berz ê li ser guliyê darê, ji kêfa nema dizanîbû bê ew ê çi bike. Bi kêf û heyecan Icir bûte bût:
- Her çi emirê te hebe, li ser serê min. Tu hema emir bikî, Siltanê min.
- Nuha tu ê berê biçe û li vê dinyayê çi qas hudhudên ku bi te ve girêdayî hebin, bîne. Min ew daristan û ew şikefta mezin a li pêşiyê da we. Hûn ê ji derveyî xwe, tu kesê din nexin wê daristanê û wê şikeftê. Ger qertelek, şahînek, teyre-
53
kî baz, sîsarkeke gurî têkeve welatê we, hûn min nîşanî wan bidin, ew ê bitirsin û careke din jî rêya xwe bi we nexin.
- Xwedê te bi miradê te şad bike, hasmetpenah.
- Miradê min ev e ku divê tu di nav gêrîkan de, nesilekî gêrîkan peyda bike. Ew gêrîk dê ew qasî girêdayî min bin ku gava min got, bimrin ew ê bimrin û bimînin ew ê bimînin. Ya din jî divê ew weha bibin dijminê gêrîkên din ku ger ez li

pêş çavên wan hemû neteweyê gêrîkan bipelçiqînim jî divê
ew bibêjin, ox. Wekî din jî divê em ji her celeb gêrîkan gelek
gêrîkên ku bi me ve girêdayî ne, peyda bikin.
Serokê hudhudan got:
- Dibe, baş e, emirê te li ser seran.
- Min hemû neteweyê hudhudan kir hem serokpropagandîstê
xwe û hem jî yê neteweyê fîlan. Li dinyayê ji vê pê ve
tu karekî we yê din tune ye. Gêrîkê Rîhsor sax be, mirî be,
hûn ê di derheqê wî de, bi lez xeberekê ji min re bînin...
Wekî din jî hûn ê gêrîkên ku naxebitin, dijminatiya fîlan dikin
û serî hildidin tesbît bilcin. Em ê gêrîkê ku serî hildide,
berê bikirin, ger em nikaribin bikirin, em ê wî bi şikenceyan
tavilê bikujin... De nuha bifire û biçe, berê biçe binihêre bê
gêrîk çi dikin û xeberê bide min. Ji nuha û pê ve, her rojê
karê te yê yekem ev e ku tu ê rewşa gêrîkan ji min re bibêje.
Dû re, tu ê gêrîkên ku peyayên me ne, li seranserî welatê gêrîkan
belav bike. Peyayên me dê li ser ruyê erdê, li binê erdê,
li hewa û li deryayê her li Rîhsoro bigerin. Ez ji vî Rîhsorî ditirsim.
Divê lîstikeke weha bileyizin da ku gêrîk Rîhsoro bi
destên xwe bigirin û ji me re bînin, an sax, an mirî... Belê, ez
Rîhsoro an sax, an mirî dixwazim. Bila dinya hemû bizanibe
ku heta Rîhsoro an mirî an sax neyê peyda kirin, rehetî ji
min re tune ye û ez ê jî welatên gêrîkan rehet nehêlim. Te
fahm kir?
Silêmanê Dunikil kir bûte bût:
54
- Min fahm kir, Siltanê me.
- Karê herî girîng, bi hevalbendên me re li welatên gêrîlcan

damezrandina rêxistinekê ye, roj bi roj ji wan xeberwergirtin
e û li dengê bêhnstendin û bêhnberdana wan guhdarîkirin e.
Niqteya herî girîng ev e. Ger em vî karê ji hundur ve organîzekirin
û xerakirinê bikin, însan ji vêya re dibêjin, mejîşuştin,
ger em bikaribin mejiyê gêrîkan bişon, ger em bikaribin
gêrîkbûna wan bi wan bidin jibîrkirin, wê gavê, em ê hertiştî
qezenc bikin. Ev sîstem dê heta qiyametê bidome û hûn ê jî
û em ê jî li ser pişta gêrîkan, bi saya xwêdana eniya wan, di
bihuştê de bijîn, ma ne wehaye?
- Rast e, Siltanê me.
- Nuha, guhê xwe baş bide min...
- Li ser seran, hasmetpenah!
- Tu dizanî bê mahneya gotina kedxwariyê çi ye?
- Ez dizanim, Siltanê me.
- A, ev gotin divê ji ferhengan bête derxistin û gêrîkek jî
dê nikaribe vê gotinê bîne ser zimanê xwe. Ev sîstema nuh a
ku me danî, sîstemek e weha ye ku ev sed hezar sal in ku neteweyên
gêrîkan bi ser de dimirin û negîhaştinê. Me sîstema
azadiyê ya ku hemû mexlûqên dinyayê bi sed hezar salan
daxwaz lciriye, lê bi dest nexistiye, diyarî wan lcir. Ji nuha û
pê ve, hemû gêrîk, fîl, hudhud û mexlûqên dinyayê dê di
azadiyê de bijîn.
Serokê hudhudan Serkumikê Berz li ser guliyê darê kir bûte
bût:
- Ew ê bi saya serê Siltanê me bijîn, em ê bijîn.
- Azadî berî hertiştî ye. Ji nuha û pê ve, em ê hemû mexlûq
di azadiyê de bijîn. Azadî, em ê hew ji bo azadiyê bi tenê
canê xwe bidin.

Serokê hudhudan baskên xwe li hevdu xistin û bang lcir:
-Azadî!
55
Siltanê Fîlan gurmijî:
-Azadî!
Çiya, deşt û daristan hejiyan. Dengê "azadî, azadî'yê li dinyayê veda.
- Peyva kedxwariyê ji devê kê derkeve, dê tavilê bête kuştin. Ger peyva kedxwariyê bi şaşî jî ji devê gêrîkekî derkeve, ew ê tavilê bête kustin. Yê ku peyva kedxwariyê ji devê wî derkeve, tu ê bi xwe wî bikuje.
- Ez ê bikujim.
- Kedxwarî tune ye.
- Kedxwarî nemerdî ye.
- Azadî heye.
- Bi tena serê xwe azadî heye, Siltanê me.
- Azadî heye... De rêya te vekirîbe. Rîhsoro qet ji bîr neke!
- Ez ji bîr nakim.
- De bifire!
Serkumikê Berz ber bi welatê hudhudan ve firiya û rast çû hêlînên wan. Hudhud hemû civiyabûn û li benda wî bûn. Gava ku mizgînî stendin, bi hezaran bask bi kêf li hevdu ketin û kirin şelpe şelp. Ew bi lez ber bi daristana ku Siltanê Fîlan dîyariyî wan kiribû firiyan. Çivîkên daristanê yên kevin qewirandin û ketin hêlînên wan. Gava hin ji çivîkan xwest li hember hudhudan rabe, yên din derhal fîl nîşanî wan dan. Çivîkên ku çav li fîlan ketin, ji van zirecêban, ziravên wan qetiyan, bi lez dev ji daristanê berdan û reviyan.

Hudhud bê deng û bê gazind li hêlînên daristanê bi rehetî bi cîh bûn. Ya rastî, ew berê ji tirsa çivîkên din newêrîbûn nêzîkî daristanê jî bûbûna. Berê nikarîbû ji nav wan deviyên riq û rût derketana, lê nuha, wan çivîk qewirandin û dest danî ser qûtên ku çivîkan ji xwe re danîbûn.

. Serokê hudhudan piştî vê, firiya û çû welatên gêrîkan. Li ser rêyan li karwanên gêrîkên reşîqîr, sorîkur, zipîzer rast hat.

56

Berê xwe ji welatên gêrîkan zîvirand û çû wê devera ku seraya Siltanê Fîlan dê lê bihata avakirin. Gêrîkan dîwarê krîstal bi qasî bihustekê ji erdê bilind kiribû. Ew li wê derê bû heyranê hêza gêrîkan. Piştî ku li ba neteweyê gêrîlcan ev hêz, ev cehd û ev jêhatîbûn hebû, divê mirov ji wan bitirsiya. Heqê Siltanê Fîlan hebû, ev gêrîk çi bikin bikin, ew ê rojekê ji bin destê fîlan rizgar bibin. Dikira bigota ji kedxwariyê... Wî dizanîbû ku êdî ew nema dikarîbû li peyva kedxwariyê bifilciriyajî... Serkumikê Berz çivîkekî pir lcal bû. Perîkên baskên wî yên belek û yên kumilca wî ya xwerû turuncî firk bûbûn. Çavên wî jî piçûçik bûbûn, lê ronahiya xwe wenda nekiribû. Ji gava ku bûye Serokê hudhudan, ji gava ku ji hêlca xwe derketiye û vir de, hemû karê wî bûye fikirandin. Li seranserê ezmên difîre û heta nuha, ji bo paraztina nesilê hudhudan bê rawestan fikiriye, nuha jî xwe dabû kêleka fîlên ku dixwest hemû mexlûqên dinyayê hêsîr bikin. Ev dem dema fîlan bû. Ew ê dinyayê têxin bindestê xwe. Wan ê keda hemû dinyayê; ya gêrîk, çivîk, dar, kêzikên cûr be cûr, kulîlk û însanan bixwarana. Ji bo vêya jî wan ê berê mejî, his, ax, av û laş dejenere bikirana. Siltanê Fîlan pir bi aqilî hereket dilcir, baş difikirî.

Divê Serkumikê Berz alîkariya wî bikira.
Berê divê gêrîk bikirana panzdeh, bîst, çil, hezar perçe, dû re jî divê her perçe bûbûya dijminê herî mezin ê perçeyê din. Gêrîkên perçebûyî, tu carî nedibûn hêz û ew ê heta dawiyê jî hêsîr bimana.
Serokê hudhudan Serkumikê Berz dû re firiya û çû welatê gêrîkan. Xwe li orta bajêr danî û mezinên gêrîkan li xwe civandin.
Got:
- Binihêrin hevalno, çi alîkariya ku ji destê min tê, ez bi we dikim. Ma ger ne ez bûma, ger min hûn li pişta xwe ne-
57
kiribana û nebirana ba Siltanê Fîlan, ba wî zatê mezin, wî zatê mexlûqê dinyayê yê herî xurt, yê ku dikare hem ava bike û hem jî xera bike, ma heta nuha li dinyayê gêrîkek bi tenê jî dima, ma dê koka gêrîkan li dinyayê ne qelihiya? Dê çi bibe, hûn li hember efilbûna neteweyê gêrîkan ê pir mezin serayekê ava dikin, piçek jî xwarin tînin embarên fîlan. Ev jî kar e, Siltanê Fîlan ê ku hem ava jî dike û xera jî dike, hûn efu kirin...
Hezar şilcir ji Siltanê Fîlan re...
Hemuyan bi hevdu re got:
- Hezar şikir ji Siltanê Fîlan re...
- Yê ku dixuliqîne jî û dieciqîne jî ew e.
Hemuyan dîsa bi hevdu re got:
-Ewe.
Di nav wan de mezinên gêrîkên zerik jî hebûn. Nerînên wan nerînên fêlbaz, pir jîr û xayin bûn. Serokê hudhudan bêyî ku hayê tu gêrîkên din jê çêbike, îşaretek da wan. Gêrîkên zerik hertişt fahm kirin, ji kêfa dilcira bifiriyana.

Gêrîkan got:
- Ji Siltên re bibêje, bibêje bê avakirina seraya te, dê di hundurê salekê de bête qedandin. Ji ber ku wî em nekuştin û em efu kirin, seraya wî dê di vê dinyayê de, seraya herî mezin û muhteşem be. Seraya wî dê ji roj û heyva ku hiltê re bibêje ku hûn hilneyên, ji ber ku ez ji bo vê dinyayê hilatime.
Gêrîkan welatê xwe yên hilweşiyayî ji nû ve ava lciribû, birînên birîndaran derman kiribûn, rewşa wan hema hema bûbû wek berê. Bextiyariya wan a berê, hema hema dest pê kiribû.
Gava gêrîk dipeyivîn, Silêmanê dunikil li nav wan her li Rîhsoro digeriya. Dibe ku dilqê xwe guhertibe û di nav gêrîkan de hatibe meydanê. Silêmanê dunikil çavên xwe yên sert û bi tesir li ser gêrîkan gerandin gerandin, lê li meydanê tu kesê ku bişibiya Rîhsoro nedît. Ma gelo ji nişka ve lê bipirsi-
5«
ya? Gelo wî dikarîbû bi vî awayî gêrîk şaş bikirana û peyvek ji devê wan werbigirta?
Ji nişka ve ket nav meseleyê, bişirî û bi awayekî nerm pirsî:
- Rîhsoro li ku ye? Ez wî di nav we de nabînim.
Gêrîk berê ketin taswasê, dû re jî weha sar man û nikarîbû tu bersiv bida Serkumikê Berz.
Serokê hudhudan dîsa pirsî:
- Rîhsoro li ku ye? Min ew bi pişta xwe welat bi welat gerandibû. Xwîna wî hîn jî li serbaskên min e, bi perîkên min ve hişk bûye. Ew ji bo çi nayê civîna ku ez tê de mim? Ez Sereksêwirdarê Siltanê Fîlan im. Yê ku nehişt welatê we bi erdê re bibe yek û li vê dinyayê koka gêrîkan biqelihe, ez bûm, ez,

ez, ez... Ger ne ez bûma, we dê dengê xwe çawa bigîhanda
Siltanê Fîlan ê mezin?
Serkumikê Berz weha kir bire bir, tevliheviyeke mezin çêkir,
lê dîsa jî di derheqê Rîhsoro de, tu gotin ji devê gêrîkan
negirt. Pir meraq lciribû, gelo çi bi Rîhsoro hatibû?
- Gelo Rîhsoro mir? Gava xwe ji ser baskê min avêt erdê,
ez dizanim ku nemir. Ew li ku ye?
Dîsa tu kesî bersiva wî neda. Gava peyv dihat ser Rîhsoro,
ew her bêdeng diman.
Serkumikê Berz bi hêrs got:
- Piştî avalcirina serayê, hûn ê şikeftan û kewarên daran tije
hunguv bikin. Siltan ji hunguv pir hez dike. Hûn ê hemû
kuliyên vê dinyayê jî bikişînin wê daristana me. Hûn ê bêyî
ku zerarekê bide tu deverên wan, fekiyên neqane ên hunguvîn,
bi tonan bikişînin serayê. Qencî bi we nabe. Ger hûn
van tiştên ku min gotin di hundurê demeke kun de pêk nînin,
êdî hûn dizanin. Tu divê qey pêwîstiya vê dinyayê pir bi
neteweyê gêrîkan hebû! Hûn tune bin jî dibe. Ew qas pir
mexlûq hene û hemû mexlûq jî pir dixwazin ji bo fîlan, ji bo
wan mexlûqên mezin, muhteşem û bi fazîlet bixebitin. He-
59
mû mexlûq ji bo ku ji fîlan re serayan ava bilcin û hemû
xwarinên dinyayê bînin, bi hevdu re qayişê dikişînin. Do,
padîşahê qertelan hat ba Siltanê me, baskên xwe yên pir mezin
vekirin û ji Siltanê me re sucde bû û got ku emir bike
Siltanê min, emir bike ku li dinyayê çi hebe çi tune be, ez ji
te re bînim. Baskên me dirêj in, dikarin li hemû ezmanan
bifirin, çavên me pir xurt in, tiştê herî piçûk jî dibîne, bêvilên

me bêhna herî dûr jî distîne, ji ber vê yekê, li dinyayê çi hebe, çi tune be, em pê dizanin. Em bi sed hezaran hene û ji bo emirê te amade ne. Ez ji we re bibêjim gêrîkên birêz, bê Siltanê Fîlan çi got, çi bersiv da qertelan. Ma hûn dibêjin çi bersiv da wan, bibêjin bê Siltên çi bersiv da qertelan. Siltên got ku bila gêrîkên min sax bin, ji roja ku dinya ava bûye û heta nuha, gêrîkên min hemû karên min dikin. Ez bi qûlên xwe yên gêrîkan re bûme wek hestî û goşt, av û axê. Ji xwe, esil û fesilê me ji gêrîkan e, pêsiyên me di destpêkê de gêrîk bûn. Ji gava ku dinya ava bûye û vir de, ne gêrîk ji fîlan vediqetin û ne jî fîl ji gêrîkan... Nebîîî, hûn dest birayên min ên gêrîk nedin, qertelno ger hûn destên xwe bi birayekî me yê gêrîk bikin, a wê çaxê ez dizanim bê ez ê çi bînim serê we. Ez ê wan ezmanên ku hûn lê difirin, biçirînim. Ez ê zinar û çiyayên ku hûn xwe lê datînin, hilweşînim û bikim erdê rast.
Qertelan got ku na gidî Siltanê me, kî dê destê xwe bi gêrîkên te yên pîroz bike. Ger ji destên me bê, em ê hemû gêrîkên te li ser pişta xwe bigerînin. Siltên got ku divê hûn weha bizanibin, ji wê roja ku dinya ava bûye û vir de, gêrîk ji esilê me ne û em jî ji yê wan... Ez li vê dinyayê, bi gêrîkên ku esilê me yek e, serbilind im. Ez nikarim sîstema xwe biguherînim, em bi gêrîkan re bi ruh û canelcî ne. Ji gava ku dinya ava bûye û vir de, ev weha ye.
Serokê hudhudan ê ku kumika wî bilind bûbû, bi hêrs ji gêrîkan pirsî:
60
- Ma ji roja ku dinya ava bûye û vir de, hûn û fîl ne yek in, hûn ji fîlan re naxebitin, hûn û fîl ne yek in, ka bibêjin

gêrîkno...
Gêrîkan li hevdu nihêrîn, bi çavan ji hevdu pirsî û bê gelo gotinên Silêmanê dunikil rast in an na, di nav xwe de lcir pise pis:
- Ev çi dibêje?
- Ma ji roja ku dinya ava bûye û vir de, em û fîl yek in?
- Ma fîl ji gêrîkan çêbûne?
- Ma ji roja ku dinya ava bûye û vir de, em serayên fîlan ava dikin?
- Ma em xwarina wan didin wan?
- Ma em zikê wan têr dilcin?
- Kî dizane, dibe...
- Dibe ku me fîl anîbin dinyayê.
- Em bapîrên fîlan in, bapîrên fîlan...
- Gêrîkek tê mahneya fîlelcî.
Bû xulxula gêrîkan, peyivîn û şêwirîn, piştî bîstikekê bi hevdu re bang kir:
- Qertel lcî ne, ji gava ku dinya ava bûye û vir de, em û fîl bi hevdu re ne.
- Qertel jî çi ne ku...
- Ew jî ji ku derketin?
- Piştî ku em hebin, çi pêwîstiya fîlan dê bi qertelan hebe?
- Piştî ku em hebin...
- Ma ev hezar sal in, deh hezar sal in, em xwarina fîlên xwe nakişînin?
- Ma em serayên wan ava nakin?
- Ma em her karê wan nakin?
Serkumikê Berz bi kêf perwaz da:

- Her gêrîk fîlek e.
Gêrîkan bi hevdu re bang lcir:
61
- Her gêrîk fîlek e.
Hemû gêrîkên li ser rêyan û li hêsaran ev bihîstin û wan jî bi hevdu re dubare kirin:
- Her gêrîk fîlek e» fîlek e, fîlek e.
Serkumikê Berz:
- Hûn ê vêya rojê sed carî bibêjin. Weha bibêjin, bibêjin belkî bi vî awayî hûn jî bibin fîl, ger hûn nebin jî qet nebe di dawiyê de, hûn ê xwe fîl an bi qasî fîlan bihesibînin.
Her gêrîk fîlek e, her gêrîk fîlek e, fîlek e, fîlek e...
Kêfa wan ji dubarekirina van gotinan ew qas hat, ew qas hat ku... Tu nema bû ku gêrîkan xwe fîl bihesibanda. Gêrîkên li ser rê û li hêsaran jî digot:
- Her gêrîk fîlek e, her gêrîk, her gêrîk fîlek e, fîlek e.
Serkumikê Berz xwest ji vê kêf û heyecanê îstîfade bike û dîsa hêdîka pirsî:
- Ma birêz Gêrîkê Kulek ê Rîhsor sax e, mirî ye, li vî welatî ye, an jî wendayî ye?
Gêrîkan bi hevdu re bersiv da:
- Her gêrîk fîlek e.
- Ez Gêrîkê Kulek ji we dipirsim.
- Her gêrîk fîlek e.
- Ger hûn aqîbeta Gêrîkê Kulek nebêjin, dê ji bo we pirr xerab be.
- Her gêrîk fîlek e.
- Ez ê vê helwêsta we ya di derheqê Gêrîkê Kulek de, ji

Siltanê Fîlan re bibêjim.
- Her gêrîk fîlek e.
Serkumikê Berz baskên xwe bi hêrs li hevdu xistin, firiya û got:
- Hûn ê bibînin.
Gava firiya jî ji bîr nekir û awirek da gêrîkên zerik.
Çû, xwe li ser dara çinarê ya ku li derveyî bajêr bû danî û li
62
benda gêrîkên zerik ma. Tam gava ku roj dikira biçûya ava, gêrîkên zerik li ser rê xuya bûn, Serkumikê Berz tavilê ber bi wan ve firiya, daket erdê, gêrîk li ser baskên xwe Icirin û bi hewa ket.
- Xwedê bike, gava hûn ji bajêr derketin, tu kesî hûn nedîtibin?
- Ma em qet xwe xuya dikin, me qesda te tavilê fahm kir.
- Siltên hûn, nesilê we li ser serê gêrîkan bi temamî lcirine parêzger. Ji nulia û pê ve, hûn ê bibin parêzgerên hemû gêrîkên dinyayê. Gava em derkevin huzûra Siltên, hûn ê jê re bibêjin ku Siltanê Fîlan em ji destpêka dinyayê û vir de, wek parêzger tayînî ser serê gêrîkan kirine. Me ev berpirsiyariya xwe bi temamî pêk aniye. Li vê dinyayê, berpirsiyarên gêrîkan em in. Di esilê xwe de, em ew fîl in ku Siltanê Fîlan ji ber gunahên me, em xistibûn kirasê gêrîkan. Esil û fesilê me fîlin.
Gêrîkên zerik li ser baskên Serkumikê Berz, bi dengekî bilind bi hevdu re bang kir:
- Esil û fesilê me fîl in.
- Ger em bi awayekî sadiq bixebitin, Siltanê Fîlan dê me dîsa bikefîl.

Gêrîkan dubare kir:
- Ger em bi awayekî sadiq bixebitin, Siltanê Fîlan dê me dîsabike fîl.
- Me bi vê yekê bawer kir, me îmana xwe pê anî!
Gêrîkên zerik dubare kin
- Me bi vê yekê bawer kir, me îmana xwe pê anî!
- Me îmana xwe pê anî!
Serokê hudhudan Serkumikê Berz ji nişka ve, peyva wan a bi kêf û heyecan birî û bêyî ku cîhê wê bû, pirsî:
- Çi bi Rîhsoro hat?
Gêrîk qet ne li benda vê pirsê bûn, peyv di devê xwe de bi-
63
nn u anin.
Silêmanê dunikil gurmijî û got:
- Bibêjin, çi bû?
Ji hêrsa xwe, wek pelê çilo dilerizî. Gêrîkên li ser baskê wî ji ber lerizandinê dilcira biketana. Baş bû ku gêrîkan xwe hişk bi koka perîkan girtibû.
- Li gora ku hûn deng nalcin, di Rîhsoro de meseleyek heye-
Gêrîkê girs ê li ser baskê rastê got:
- Em Rîhoro qet nas nalcin. Me ne ew dîtiye û ne jî em wî nas dilcin.
Silêmanê dunikil baskên xwe bi awayekî pir ecêb kil kirin û got:
- Hûn dizanin, hûn dizanin. Li dinyaya gêrîkan, ji vira û heta Çîn û Maçînê, yê ku Rîhsoro nas neke, tune ye. Ew li dinyayê rêberê hemû gêrîkên hesinker e. Herkes wî nas dike.
- Me ne dîtiye, ne jî bihîstiye û ne jî em hesinkerekî weha

nas dilcin. Dibe ku ew ji welatekî din be.
Serkumikê Berz bang Icir:
- Nabe, ew ji welatê we ye.
Gêrîkê girs got:
- Wê gavê, em gêrîkên pir xort in, ew berî ku em çêbibin, miriye.
Serkumikê Berz dengê xwe bilind lcir û got:
- Hîn do bû, yê bi Siltên re peyivî, ew bû. Hîn do bû, ew li ser baskê min bû, a li vî cîhê ku hûn lê ne.
Gêrîkê zerik î kal î girs got:
- Hiii, min fahm kir. Ez dizanim, ew ne ji me ye, ew gêrîkekî sor e... Ew ji aliyê welêt ê din e. Em wan deveran nas nalcin. Di nav ew qas gêrîkan de, em çi dizanin bê kî Rîhsoro ye? Ger Siltan emir bike, li ser ruyê erdê bi milyaran gêrîkên zerik hene, em ê li wî Rîhsorî bigerin û peyda bilcin.
64
Serkumikê Berz hêrsa xwe ji bîr Icir û got:
- Baş e, baş e. Nexwe, hûn ê Rîhsoro peyda bikin?
- Em ê wî an sax an mirî peyda bikin û ji Siltanê xwe re bînin. Esil û fesilê me fîl in. Em dû re bûn gêrîkê zerik ên piçûçik.
Gêrîkên din jî dubare kir:
- Esil û fesilê me fîl in. Em dû re...
-An sax an mirî...
Bi vî awayî hatin huzûra Siltanê Fîlan. Siltan li wê derê, mîna çiyayekî spî xuya bû. Qûna xwe dabû nava dara çinarê ya kevnare û her tê dida. Dara çinarê mîna ku zelzele lê çêbûbe, di nav toz û dûmanê de mabû, pelên wê û guliyên wê dişikestin û diketin erdê, dar heta erdê ditewiya û dû re bi

çîrke çîrkê bi şûn de vedigeriya.
Serkumikê Berz tevî ku demeke dirêj di ber çavên Siltên re çû û hat, bi dengekî bilind kir bûte bût jî Siltên ew nedît.
Piştî ku di navberê de, demeke pir dirêj derbas bû, dara çinarê ji kokê de şikest, der û dora xwe hejand û bi gurmîn wergeriya erdê. Wê gavê, fîl jî ji wê mestbûna xewa xwe ya şêrîn a xwexurandinê şiyar bû û hudhudê ku li ser serê wî bi dengekî bilind dikir bûte bût dît.
- Hooo, birayê min î Silêmanê Dunikil, Serelcşêwirdarê min, tu bi xêr hatiyî, tu bi xêr û xweşî hatiyî, çi heye, çi tune ye, çi xeber ji qûlên min ên gêrîk hene?
Serkumikê Berz got:
- Gava ez hatim hemû welatên gêrîkan bi hevdu re bang dikir û digot ku her gêrîk fîlek e, her gêrîk fîlek e, fîlek e...
Ji kêfa şerpînî ji guhên xwe anî û got:
- A, ev baş e. Rast e, her gêrîk fîlek e.
Gava gêrîkên li ser baskên Serkumikê Berz ev bihîst, hemuyan bi hevdu re bang kin
- Her gêrîk fîlek e. Her gêrîk...
65
Siltên got:
- Min dengek bihîst. Hin kes tiştinan dibêjin.
Serkumikê Berz got:
-Haaa, tew gava min ruyê Siltanê xwe yê bi nûr dît û ji ber nûra ruyê wî çavên min hatin girtin, tu nema bû ku min ji bîr bikira. Min gêrîkên ku ji nesilê gêrîkên zerik in, bi xwe re anîn, va li pişta min in.
Siltên pirsî:

- Çi dibêjin.
- Heta vê derê, wan li ser pişta min bê rawestan bang kir, dîsa jî her eynî gotinan dubare dikin; esil û fesilê me fîl in, fîl in, Siltanê me dê me dîsa bike fîl. Ger em bi awayekî sadiq bixebitin...
- Baş e, baş e, her tişt pir baş diçe. Wan ji ser pişta xwe daxîne û were ba min. Gêrîkên min ên zerik têxe qalikê wê darê, bila li wira îstirehetê bikin. Ji wan re bibêje ku min ev dar ji bo wan wergerand, bila li ser pelên wê û di qalikên wê de, xweş îstirehet bilcin û betilandina xwe ji ser xwe biavêjin.
Gava Serkumikê Berz ev gotinên Siltên ji gêrîlcan re wergerandin, gêrîk ji kêfa mest bûn û bang lcir:
- Her bijî, Siltanê me! Esil û fesilê me fîl in, fîl in. Em fîlên ku ketine kirasên gêrîkan in.
- Çi dibêjin?
- Dibêjin ku em fîlên ku ketine kirasên gêrîkan in.
- Çi xweş dibêjin, ne weha?
- Pir xweş dibêjin, Siltanê me.
- Divê ez jî fêrî zimanê gêrîkan bibim, ne weha, birayê rriin î Serkumikê Berz?
- Minasib e, şaliê min.
- Madem ji roja ku dinya ava bûye û vir de, ez padîşahê gêrîkan im...
- Tu padîşahê wan î, Siltanê me.
66
- Em di warê fêrbûna zimanê yên binemirî xwe de, pir dereng man in, pir dereng, pir dereng...
Serkumikê Berz keserek lcişand û got:

- Piiir dereng.
Siltên got:
- Nuha, were em bipeyivin, hevalo. Gelek tiştên ku divê em bi hevdu re bipeyivin, hene. Lê bi dizî...
Silêmanê Dunikil got:
- Em bi fîlî bipeyivin. Awayê herî bi dizî ev e. Gêrîk hîn fêrî zimanê fîlan nebûne. Ez ê berê, ji Siltanê xwe re behsa tiştên ku ez pê dizanim û min bihîstine bikim û dû re em ê wan tiştên bi dizî bipeyivin.
Piştî ku Serokê hudhudan ji Siltên re, yek bi yek behsa tiştên ku dîtibûn, dizanîbûn û yên li ser Gêrîkê Sor bihîstibûn û helwêstên gêrîkan lcir, got:
- Tiştên ku ez ê bibêjim ew qas in.
Û deng jê biliya.
Siltên piştî ku ew pîroz lcir, got:
- Nuha li min guhdarî bike, birayê min î Serkumikê Berz. Gidîîî, karê me yê yekem divê ev be ku em gêrîkan fêrî fîlî bikin. Zimanê gêrîkan tune ye, ger hebe jî têr nake, te fahm kir? Ger hebe jî sê-çar peyv in. Bi sê-çar peyvan jî li vê dinyayê nayê jiyîn. Li dinyayê bi tenê zimanek heye, ew jî zimanê fîlan e.
Serkumikê Berz kumika xwe ya mezin nepixand û got:
- Zimanê fîlan e.
- Ji nuha û pê ve, hûn ê jî bi zimanê çivîkan nepeyivin.
Min zimanê çivîkan li neteweyê hudhudan qedexe lcir. Her kî dibe bila bibe, yê ku bi zimanê çivîkan bipeyive, dê herdu baskên wî tevî zimanê wî, ji kokê de bên jêkirin. Ji nuha û pê ve, tu çivîk dê bi zimanê çivîkan nepeyive, ew ê bi zimanê

fîlan bipeyive.
67
- Belê, Siltanê min, ez ê nuha ber bi daristana ku te diyarî me kiriye, bifirim. Ez ê ji qûlên te yên hudhudan re bibêjim, da ku ew tavilê dest bi fêrbûna fîlî bilcin.
- De zû here û were.
Serokê hudhudan gîhaşt daristanê, lê çi bibîne, hemû heywanên li daristanê, heta beytikan jî ji zû de dest bi fêrbûna fîlî kiriye, çîv çîva wan bû û dipeyivîn.
- Me bihîst, me emirê Siltanê Fîlan bihîst. Ma qey zimanê çivîkan jî ziman bû... Zimanê çivîkan ji xwe, zimanekî bêfesal, xerabe û ji tu tiştekî re ne dibû. Gava ku hemû dinya bi zimanê fîlî dipeyivîn, me di axavtina vî zimanê çivîkan ê xerabe de, her înad lcir. Em ê di hundurê çend mehan de, berî gêrîkan jî berî mexlûqên din jî û berî mirovan jî ferî fîlî bibin. Me sed û sêst mamosteyên fîlî peyda kirin, em ji sibehan heta êvaran û ji êvaran heta sibehan fêrî fîlî dibin.
Serokê hudhudan bang kir:
- Bijî hudhudno! Siltanê Fîlan dê bi we serbilind be.
Hudhudan got:
- Ji xwe, esilê me fîl e. Fêrbûna fîlî dê ji bo me qet ne zor be. Gava hemû dinya bi fîlî bipeyivin, di rêya medeniyetê de paşdemayin bi me nakeve. Ji ber ku hemû fîlan bi fîlî dizanîbû, heta ser heyvê çûn. Lê bi tenê ji ber ku em bi fîlî nizanin, em nikarin ji vê daristanê heta deryayê bifirin.
- Em ê fêrî fîlî bibin û biçin ser heyvê û xwe mîna fîlan li ser guliyên heyvê deynin.
Dengê wan li daristanê olan da:

-Wekfîlan!
- Gêrîk jî dê fêrî fîlî bibin, biçin ser heyvê û li wira ji padîşahê heyvê re serayekê ava bikin û embarên padîşahê heyvê bi hunguv dagirin...
Daristan bi dengê wan hejiya:
-Gêrîkjî!
68
- Em ê biçin ser rojê.
Dengê wan li daristanê veda:
- Ser rojê!
-Gêrîkjî...
Zingînî ji daristanê hat:
- Gêrîk jî!
Serokê hudhudan dengê xwe birî, dû re dîsa bi kêfpeyivî:
- Siltanê Fîlan ji ber vê jîrbûn û serwextbûna we, dê sê embarên tije kulî bide me hemuyan, Siltanê me sirfji bo we, beşeke mezin ji gêrîkan, ji bo anîna kulîyan veqetand.
Daristan bi dengê "bijî bavê me Siltan, xwediyê me!" olan da.
- Pêşniyareke min ji we re heye.
- Pêşniyara te li ser serê me...
- Nuha, hûn ê hemû bi hevdu re rabin, mamosteyên xwe yên fîlî jî bi xwe re bibin û rast bifirin biçin welatê gêrîkan. Hûn ê bi gêrîkan re gêrîkî û çivîlcî tavilê ji bîr bikin û fêrî fîlî bibin.
Daristan bi dengê "ya Xwedê, ya Xwedê" kil bû. Hemû hudhud bi hewa ketin, ezman ji nişlca ve, bi serên turuncî û baskên belek ve hat nixumandin. Ezman bi dengê şelpîna

baskan hejiya. 0 hudhud ber bi welatê gêrîkan ve firiyan.
Wan weha kêf dikir ku ew ê zimanên gêrîk û çivîkan ên xerabe
ji bîr bikin, bidin jibîrkirin û zimanê fîlan ê bi esil fêr
bibin û fêr bikin.
Serkumikê Berz ji ber serkevtina xwe serxweş ket. Ji kêfa,
serê wî gêj bû û bi lez firiya, xwe gîhand Siltanê Fîlan û tiştên
ku qewimîbûn, yek bi yek ji wî re gotin. Siltan jî bêyî ku
li wî laşê xwe yê girs û pir mezin bifikire, çeng bû ser xwe,
rabû ser herdu lingên xwe yên dawiyê, xortima xwe ber bi
ezmên ve bilind kir, guhên xwe vekirin, kir şelp şelp û dest
bi lotikan kir.
69
Serkumikê Berz firiya, li dora serê wî zîvirî û ji ronahiyê
xeteke turuncî çêkir û got:
- Bijî siltanê me! Bijî siltanê me, bijî bijî...
Siltan piştî ku demeke dirêj da lotikan, bi şûn de vegeriya
û li ser textê xwe mexel hat. Textê wî ji tahteke mor î xiramolcî
bû. Ji ber vê yekê, Siltan li ser textê xwe ne rehet bû.
Serkumikê Berz heta ku deng tê de hebû, lcir barînî:
- Ji siltanekî dinyayê yê weha re, textekî weha nabe!
Siltanê Fîlan xortima xwe bada û got:
- Qet nabe, nabe.
- Ez ê derhal emir bidim gêrîlcan, bila dakevin orta dinyayê
û madena almasan a li wê derê peyda bikin û ji Siltanê me
re, ji almasa şîn a herî mezin textekî çêbikin da ku textê Siltanê
me li vê dinyayê mîna rojê şewq bide. Her ku şewq da,
bila ronaliiyên şîn li dinyayê bibarin. Bila dinya şipîşîn bibiriqîne.
Sebira Siltên êdî nemabû.

Got:
- Zû emir bide gêrîkan. Bi lez bi lez, a nuha.
Serkumikê Berz wê gavê firiya û xwe gîhand welatê gêrîkan. Komîteya Birêvebir a gêrîkan tavilê civand û emirê xwe got. Gêrîkan gazind Icirin û got ku em ê çawa dakevin orta dinyayê û almasa şîn a ku ji rojê jî bêtir dibiriqîne, peyda bikin û textî jê çêbikin?
Serokê hudhudan tew gazindên wan nebihîstin jî û bi şûn de vegeriya. Hilma xwe bi zorê dida û distend.
Got:
- Min got. Berî serayê dê text bête çêkirin. Ma împaratorekî dinyayê yê weha qet bê text dibe?
Siltên got:
- Nabe! Wekî din jî bila gêrîk heykelê min çêbikin, divê heykel sed carî li min be.
70
Serkumikê Berz pirsî:
- Ma ez a nuha biçim ba gêrîkan?
Siltên got:
- Raweste, hemû bi hevdu re nabin. Hela bila berê orta dinyayê bikolin û textê ku şîn dibiriqîne, çêbikin. Nabe ku em çavên wan bitirsinin.
Serokê hudhudan got:
-Raste.
- Li welatê gêrîlcan, karê zimên çawa bû?
Serkumikê Berz got:
- Min dît, min dît ku hemû gêrîk û hudhudên me, li ser rê, li hêsaran, li kar, di nav nivînan de, li malê bê rawestan

fêrî fîlî dibûn û zimanên xwe, yanî zimanên xwe yên hov ji
bîr dikirin.
Siltên got:
- Ev a herî baş e. Tu şêwirdarekî yeman e, birayê min î Silêmanê
Dunikil. Ez hemû fîlan jî dixim bin emirê te. Qûlên
min ên fîl nuha çi dikin?
- Bi şûn de vekişiyane daristana mezin, her yelcî ji wan qûna
xwe daye darekê û her pê dixurîne. Gêrîk jî bê rawestan
xwarinê ji wan re dikişînin û li ber wan kom dilcin. Ew jî bi
tenê xortimên xwe dirêj dikin, ew qas. Ew her xwe dixurînin,
mest dibin û ji ser hişê xwe diçin. Jiyana wan, jiyana bihuştê
ye.
Siltên got:
- Bi tenê, ez dixebitim. Ji bo ku ez bikaribim gêrîkan heta
qiyametê weha bihêlim, malik li min xera dibe û tu jî... Ji
berdêla ku ew weha vedikevin û qûnên xwe dixurînin, qet
nebe, li vê dinyayê belav bûbûna û hemû mexlûq fêrî fîlî bikirana.
Qet nebe, bi kêrî vî karî bihatana. Welcî din jî hin
lîstokên ku dê gêrîk hertim mijûl bikirana û nehistana dw
bifikirin, îcad bikirana. Yên ku gêrîkan hişk bi koletiyê ve gi-
7i
rê bidin... Fîl bi aqil in. Di nav mexlûqên dinyayê de, yên
herî biaqil fîl in. Divê em ji gêrîkan re, lîstokin weha peyda
bikin ku nehêlin çavên wan vebin û li tu gotinan bifikirin.
Ger gêrîk bifikirin, kengî be, ew ê ji bo bikaribin ji vê sîstema
azadiyê rizgar bibin, rêyekê peyda bikin. Ji bo filcrê, li vê
dinyayê hertişt ebedî ye. Ger gêrîk bin jî gava bifikirin, ew ê
rojekê rêyekê peyda bikin û zora fîlan bibin. Ji ber vê yekê,

em ê destûrê nedin fikira gêrîkan a herî piçûk jî. Ji bo ku em destûrê nedin jî divê em, hemû fîl, hudhud, gêrîkên zerik, yanî hemû kedxwar, na na, azadîxwaz, serê xwe pir pê biêjîhin û tiştin nuh îcad bikin, da ku ew nikaribin heta qiyametê bifikirin. Wekî din jî ez wî Kulekê Rîhsor dixwazim. An mirî an sax. Ma gava welatên gêrîkan hildiwejiyan, ê ku bi min re dipeyivî ne ew bû? Dengê wî yê bi hêrs ê ku ez piçûk didîtim, hîn jî di guhên min de ye... Ew bû, ne weha?
-Ewbû.
- Ma te gotibû, hesinker e?
- Ji Hezretî Dawid û vir de, hemû esilê wî hesinker e.
- Ev xerab e, hem destên hesinkeran û hem jî serên wan dixebitin. Li vê dinyayê yên herî bi xeter, mexlûqên weha ne. Welcî din jî fikirên kesên weha, mîna mîkropên ku nexwesiyê belav dikin, bi carekê li hemû dinyayê belav dibin.
- Em ê Gêrîkê Kulek î Rîhsor peyda bilcin. Ger miribe jî em ê termê wî ji Siltanê xwe re bînin. Dû re, em ê termê wî li orta welatê gêrîkan daliqînin. Gêrîkên zerik ên ku ji aliyê gêrîkên din ve piçûk tên dîtin, dê di vî karî de alîkariya me bikin.
Siltên got:
- Ancax yên ku piçûk tên dîtin, yên lawaz, bi hirs û yên ku gêrîkbûna xwe wenda kiribin, dikarin îxanetê bi esilê xwe re bikin. Evên zerik mexlûqin çawa ne?
Serokê hudhudan got:
72
- Ger tu carekê wan bibînî, Siltanê me, ger tu carekê wan bibînî, ew qas zer zer in ku tijtekî mîna jefafê. Gêrîk in, lê tu

tijtekî wan najibe gêrîkan. Wekî din jî ew qas tiral in ku...
Siltên got:
- Tiralbûna wan baştir e. Ew ê hîn bêtir ji lcarê me re bibin. Ji bo xatirê piçeke genim, piçeke kêzik, ew ê bibin qûl û koleyên me.
- Ger bibîne bibîne, gêrîkên zerik dê jopa Rîhsoro ji me re bibîne.
- Here, wan bîne vira.
Siltan bîrsar in. Wî ji zû de ji bîr kiribû ku Serkumikê Berz gêrîkên zerik anîbûn ba wî. Dîsa firiya, çû zerikên di qalikê darê de bûn anî û hat.
Mezinên zerikan, Siltan û Serkumikê Berz sê roj û sê jevan rûnijtin, dûr û dirêj peyivîn û li hevdu kirin, li rêyên ku gêrîkan heta qiyametê hêsîr bihêlin geriyan û peyda lcirin. Dê hîn jî peyda bikirana. Ji ber vê yekê, ji bo fikirandinê, bangî artêjeke fîlan, yeka hudhudan û yeka gêrîkên zerik kir. Her fîl, her hudhud, her gêrîkê zerik, ji bo ku nehêle gêrîk bifilcirin, dê bîst û çar saetan bê rawestan li ser peydakirina çareyekê bifikiriya.
Siltên got:
- Pirsa herî sereke ziman e. Vêya ji bîr nekin. Ew ê berê zimanê xwe ji bîr bikin û gêrîkbûna xwe wenda bikin û ew ê ji dil bbcwazin bibin fîl. Ew ê bê rawestan fîlan teqlîd bilcin. Di dilê her gêrîkekî de, daxwaza ku bibe siltanekî fîlan dê bi cîh bibe. Ji berdêla ku mirov serê gêrîkan jê bike, ya rasttir ew e ku mirov zimanên wan jê bike. We gotina min fahm kir?
- Me fahm lcir, Siltanê me.
De wê gavê, dest bi xebatê bilcin. Berê Rîhsoro... We li ku

yekî rîhsor peyda kir, nekujin, bînin ba min. Dû re jî li Kulekê Rîhsor bigerin, temam?
73
- Serkumikê Berz û mezinên gêrikên zerik got:
- Temam.
- ji bîr nekin ku hûn ê zimanê wan bi wan bidin jibîrkirin.
Wan got:
- Yê yekem ev e. Ew ê rojekê berî rojekê, zimanê xwe ji bîr bilcin. Ji nuha de jî ji bîr kiriye.
- Her gêrîkekî zerik dê bibe serokê yekîneyeke gêrîkan.
Min weha ferman da. Yên zerik lejkerên min ên di nav gêrîkan de ne. Serokê hudhudan, rabe biçe û vê fermana min jî bigihîne welatê gêrîkan. Divê tu gêrîkê ku ev fermana min nebihîstibe, nemîne. Yên ku li hember gêrîkekî zerik rabin, li hember min radibin. Vêya jî ji gêrîkan re weha bibêje.
- Fermana te li ser seran, Siltanê me.
Serokê hudhudan gêrîkên zerî li pijta xwe kirin û berê xwe da welatê gêrîkan.
74
SISÊ
Gêrîkên ku dest bi kar kirine, di bin barên filan ên giran de dieciqin û ji bo ji vê rewşa xerab rizgar bibin, nikarin tu rêyan peyda bikin.
Siltanê Fîlan bi ser Serokê hudhudan de lcir bire bir. Ji ber dengê wî, dejt û çiya hejiyan. Gêrîkên ku dengê wî bihîst, mîna pelên çilo lerizîn.
Siltên digot.
- Ez ê gêrîkekî bi tenê jî nehêlim. Ger di hundurê vê salê

de, seraya min neqede, ez ê li vê dinyayê kolca gêrîkan biqelihinîm...
Ez ê koka wan, kolca wan biqelihînim.
Serkumikê Berz li dora serê wî difiriya û digot:
- Ez di bextê te de me, Siltanê me. Ez di bextê te de me,
Siltanê me, tu çi dikî? Gêrîk pir dixebitin, ez di bextê de me,
Siltanê min.
- Pirr dixebitin, lê ka seray li ku ye? Ez dinihêrim, dinihêrim,
lê nabînim.
- Lê binihêre, Siltanê me, lê binihêre bê serê çiyayî çawa
dibiriqîne... Wan dîwarê wê bi qasî bejnekê bilind Iciriye.
Siltan gurmijî û got:
- Hîn pirtir, hîn bileztir. Çi hayê we ji Sitiya gêrîkan heye?
- Sitiya gêrîkan dizê û bê rawestan gêrîkan tîne dinyayê.
Rojê, bi milyaran gêrîk bejdarî avakirina serayê dibin... Gêrîk
li erd û ezmên, li çiya, li kevir û kuçikan, li çem û deryayan,
li xerq û daristanan bi xulxuleke mezin tev de diçin û
75
tên. Dinya hemû bûbû gêrîk...
- Ê bas e. Ne xwe, ji bo ku seraya min di demeke pir nêzîk
de biqede, ew qas gêrîk jî têr nakin?
Serokê hudhudan kir bûte bût:
- Seray dê biqede. ew ê di hundurê vê salê de biqede.
- Lê textê min?
Serkumikê Berz got:
- Gêrîkê dilqecêb do ji min re got ku gêrîkan dinya ji heft
aliyan qul kirine, ji heft milan ber bi orta dinyayê ve dadikevin.
Hindik maye ku xwe bigihînin çiyayê almasa jîn.
Siltan ji cîhê xwe çeng bû:

- Hindik maye ku xwe bigihînin çiyayê almasa jîn?
Serkumikê Berz got:
- Hindik maye. Hindik maye ku bigihêjin çiyayê almasa jîn, almasa kesk, almasa mor, almasa pembe û ya turuncî. Li orta dinyayê, çiyayên almasan ên rengareng hene. Bi qasî ku nikare bên hesibandin, bilind û pir almasên brîlyan... Mîna ronahiya tavê, her brîlyanek mîna jewqa tavê ya qeşagirtî ye, Siltanê min. Tam di orta dinyayê de, jewqa tavê ya qeşagirtî...
Siltanê Fîlan bi tirs û hêdîlca peyivî:
- Hij, bang neke. Dengê xwe bibire, birayê min î Hudhud, hiiiijjj! Were ba min û guhê xwe bîne ber xortima min, ez ê ji te re peyvekê bibêjim, peyveke bi dizî.
Serokê hudhudan guhê xwe bir ber xortima wî.
- Binihêre, Serkumikê min î Berz, ez ê ji te re peyveke pir girîng bibêjim. Li min guhdarî bike, ma hayê mirovan ji vî çiyayên almasan heye?
Serkumikê Berzgot:
- Bi qasî ku ez dizanim, hayê wan jê tune ye. Hîn hayê wan jê çênebûye.
- Nebî nebî! Nebî nebî, bila ew nizanibin, nebînin, nebi-
76
hîsin! Ger ew bibihîsin, mala me dê bijewite ha! Em ê bijewitin, bijewitin!
Serkumikê Berz gotina wî tesdîq kir:
- Em ê bijewitin!
- Ew ê ji bo almasan dinyayê biteqînin.
- Ew ê biteqînin, Siltanê min.
- Ji gêrîkan re bibêje ku bila însan cîhê çiyayên almasan

nizanibin û nebihîsin.
- Ew ê nizanibin, Siltanê min.
- Almas yên min bi tenê nê, birayê min î Serkumikê Berz,
ên min bi tenê. Ên min, ên Siltanê Fîlan bi tenê.
- Ew almas bi tenê li te, li Siltanê me, li Siltanê hudhudan
ê mezin dike.
- Bila qertel jî nebihîsin.
- Ez ê bibêjim, Siltanê min.
- Ew balînayên ku avê dipejiqînin ezmên jî...
- Ew ê nebihîsin, Siltanê min.
- Sîsarkên gurî mexlûqin ecêb in, situyê wan xwar û xemgîn
in...
- Ew almasan naxwazin.
- Hespan jî ji bîr neke...
Serkumikê Berz got:
- Li hespan dike, li wan heywanên xwejik...
- Li wan dike, nake... Bila hayê wan jî ji çiyayên almasan
çênebe.
Serkumikê Berz situyê xwe xwar kir û got:
- Hayê wan dê jê çênebe.
- Piling bela serê dinyayê ne, hov, çavbizotî û dîn in. Ger
hayê wan ji çiyayên almasan çêbibe, ew ê bi diranên xwe bikolin
û xwe bigihînin orta dinyayê...
- Ew ê xwe bigihîninê, Siltanê min, ew ê qet nebihîsin.
- Bila mar, teyrê baz, masî, gumgumok, kelmêş, serçe û
77
mamût jî nebihihîsin.
- Mamût tune ne, Siltanê min. Ew pêşiyên me ne.

Siltanê Filan got:
- Mixabin ku ew mirin. Pêjiyên me yên muhtejem. Çi heyf. Bila çirçirk jî nizanibe...
Serkumikê Berz got:
- Bila ew gêjika ha nizanibe.
- Papexan bê kêr in. Ew qûngird in.
Serokê hudhudan got:
- Boyaxkirî, forsek, teqlîdkar...
Siltên got:
- Ez ji teqlîdkaran hez nakim. Bila teqlîdkar di bin erdê kevin.
Serkumikê Berz got:
- Em serayê ji van almasan ava bikin, ew ê li Siltanê me jî bike.
Siltên bi ken got:
- Dê li min bike, lê gêrîk dê vê seraya almasî di çend salan de biqedîne?
Serkumikê Berz got:
- Ew ê pir dirêj biajo.
Siltên got:
- Bila vê gavê krîstal be. Belûr jî wek almasê ye.
Silêmanê Dunikil got:
- Seraya Siltan Silêman ji madenê sifir bû. Te dît, ew Silêmanê kurê îsraîl...
Siltan pesinî û got:
- Min bihîstiye. Min ew bihîstiye.
Serkumikê Berz got:
- Seraya Belkisê ji zêr bû. Min ew dît. Li ser serê çiyayekî

bû. Dilê Silêmanî nelcet wê, ket seraya wê.
Siltên got:
78
- Seraya min dê ji zimrûd, almas, brîlyan û belûrê be.
- Belkis pir xwejik bû. Yeka esmer bû, canê wê wek pembo nerm û çavên wê zerî û girs bûn. Bejinbilind bû. Dilê Belkis ket wî Silêmanê lcinik. Silêman porxelekî bû.
Gava ku ew weha dipeyivîn, bayekî dest pê kir û sitêrk vir de û wê de birin. Sitêrk tev li hevdu bûn, vir de û wê de kil dibûn. Sitêrk li ser rengê jîn belav dibûn û dirijiyan. Ji daristanê jewq dipejiqî, jewqeke kesk. Li dinyayê ji serî heu binî, ji rengê jîn, jînên mangdayî belav dibûn. Li aliyê din, axa pir nerm, nazdar, bi ber û bereket mîna jineke di çax û benga xwe de, hatibû raxistin.
Dareke çinarê ya mezin hat û xwe li hember, li wê palê, li binya zinêr danî û bû xijxija guliyên wê. Ronahiya elektrîkê ya bajarên mezin vêket û vemirî, xumxumek li wê dorhêlê belav bû. Sîrenan li ser hevdu lêxistin. Sitêrkek pengizî û rijiya, hat li ber Siltên û Serkumikê Berz ket. Siltên nema dikarîbû çavên xwe vekirana, heta demekê çavên wî qet tu tijtek nedît. Çemekî mezin hat, di ser sitêrkê re herilcî. Cîhê sitêrkê bû mêrgeke mezin. Li mêrgê darên bihîvan çêbûn, dar ji serî heta binî, bi kulîlkan ve xemilîn. Kulîlk bûn sitêrk, bûn ezmanê jîn; ezmanê jîn bû kevolca spî, bû marê sor. Siltanê Fîlan xortima xwe dirêj lcir û ew bêhn kir.
Got:
- Di vê dinyayê de, textekî wek textê min dê qet nehatibe dîtin. Ez ji wê sitêrka ku bîstikeke berê hat vê derê jî textekî

dbcwazim.
- Gêrîkên qûlên te, Siltanê me...
Ji gêrîkên qûlên min re bibêje... Mexlûqên ku textê min
bibîne, dê ji çavnebariya xwe, ji heyraniya xwe biteqin û bimirin.
Serkumikê Berz got:
- Ew ê bimrin.
79
Bêhna nêrgizê ji dinyayê hat. Çi xwej e. Sikên xortima
xwe ya dirêj, dirêj kir û dinya bêhn lcir.
- Ez ji vê bêhnê dbcwazim, Serkumikê Berz.
- Seray bê bexçe nabe.
Siltan ji dil keniya û got:
-Nabe.
- Tu ji hemû mexlûqan girstir û li ser serê hemû mexlûqan
Silran î. Tu, seraya te û hevalên te dê yên herî muhteşem
bin...
Siltên bang kin
- Bijî gêrîlc! Ez ê li wan gêrîkên xwe pir miqate bim, ez ê
xwarinê jî bidim wan. Ew ên min...
Serkumikê Berz got:
- Hiiiiijjjjs, hiiiiijjjjj, Siltanê min!
Deng ji Siltên biliya. Serkumikê Berz jî wê gavê dest bi girî
kir. Hem digiriya û hem jî di cîhê xwe de nedisekinî û digot:
- Ez ê çi bilcim, ez ê çi bikim, ez, ez, ez...
- Hij, negirî, birayê min!
Serkumikê berz giriyê xwe domand.
- Negirî, ez ê gelek xwarin bidim te.
- Sitêrk bariyan mîna baranê, ez ê bigirîm.

- Ez ê ji bo te jî ji almas, yaqût, brîlyan û yejîmê hêlînekê bidim çêkirin. Hiş negirî, hijjj!
- Guliyên ku ez xwe li ser datînim dê birizin.
- Bila birizin, huiiiiijjjj!
- Co û cobarên ku ez jê vedixwim dê zuha bibin.
- Dê zuha bibin, hiiijşjj!
- Kêzikên ku ez wan dbcwim dê bimirin!
- Dê bimirin, hiiiijjjjj!
- Ax, derya, hemû av dê bibin jahr, ez ê çi bikim?
Siltanê Fîlan jî dest bi girî kir û got
- Dê bibin jahr, jahr.
80
- Binihêre Siltanê min, dar, daristan, mêrg, av û zinar dimejin ser deryayê.
- Baj e, bihêle, bila bimejin.
- Tarî dimeje ser deryayê, Siltanê me.
- Bihêle, bila bimeje.
- Ronahî diherikin, bi guve guv..
- Bihêle, bila biherikin...
- Li paj deryayê, hîre hîra hespekî ye, Siltanê me.
- Ew hesp ê me ye.
- Xezalekê xwe çeng kir.
- Ew xezal a me ye.
- Dinya bû xwerû gêrîk, erd û ezman bû xwerû gêrîk.
- Gêrîk jî yên me ne.
Siltan ji nijka ve û mîna ku ji xewekê jiyar bibe, li xwe hay bû û çavên xwe firkandin.
Ji Serkumikê Berz pirsî:

- Çi bi me hat?
- Sitêrk bi ser me de bariyan, xezal, hesp, ewr, dar, kulîlk
bi ser me de bariyan, Siltanê min. Almas, brîlyan, yaqûtên
sor, ronahî bi ser me de bariyan, Siltanê me.
Ji gêrîkan re bibêje ku ez seraya xwe derhal dbcwazim, derhal.
Ez textê xwe, a nuha a nuha dbcwazim.
Serkumiikê Berz got:
- Ez, ez, ez ê bibim çi? Ez, ez jî... Ji min re jî...
Siltanê Fîlan got:
- Tu dikarî hêlîna xwe, li ser sivinga seraya min çêbilcî. Ji
wan re bibêje, bila gêrîk ji bo te jî xwarina ku têra sed salî dike,
bidin hevdu.
Serkumikê Berz xwe avêt ber lingên wî û got:
- Tu sax bî, Siltanê min.
- Nuha, ez textê xwe yê ji almasa şîn dixwazim.
- Li ser seran, Siltanê min. Textê yê ji almasa jîn jî dê di
81
hundurê vê salê de bête çêkirin. Dê bête çêkirin, lê...
- Lê çi, bibêje!
Serkumikê Berz bersiva vê pirsê neda. Ew li tijtekî din difilcirî.
Filcira xwe ji Siltên re got:
- Tu ê bihêlî ku ez jî xwe li ser textê yê ji almasa jîn deynim?
Siltan pijtî ku baj fikirî, bersiv da:
- Ez ê bihêlim.
- Gava dinya birize, textê te yê almas ê ku ji ronahiya jîn
narize, ne weha? Gava ez xwe li ser deynim...
- Narize.
- Wê gavê, li min guhdarî bikî, Siltanê min.

- Ez li te guhdarî dilcim, birayê min î Hudhudê biaqil,
xwejik, muhtejem û kumik bijewq.
- Ez ê nuha ji te re bibêjim ku... Ez bi van baslcan ji sibehê
heta êvarî, ji bakur ber bi bajûr ve û ji bajûr ber bi bakur ve
li ser serê dinyayê, pir û pir firiyame.
- Belê, çi di bin zimanê te de heye, bibêje.
- Gêrîkên me yên welatê gêrîkan tên bîra te?...
Siltên xwe vezeland û got:
- Belê.
- A ew qas gêrîk, yanî gêrîkên welatekî nikarin hemû daxwazên
me pêk bînin. Qiralîçe çi qas pir gêrîkan bîne dinyayê
jî dîsa hêza wan têrê nake.
Siltanê Fîlan got:
- Wax wax, waaax! Wê gavê em çi bilcin?
Li vê dinyayê hîn gelek welatên gêrîkan hene.
- Na lo! Bi rastî?
Welatek heye ku ji serî heta binî, tev de daristan e. Gêrîkên
wî welatî girs û bi heybet in. Masûlkên gêrîkên wê derê
gelekî xurt in. Ew ê pir bi kêrî me bên. Ji wî welatî re dibêjin,
welatê gêrîkên rej.
82
Serokê hudhudan pijtî wê, li dinyayê çi qas welatên gêrîkan
hebûn, hemû yek bi yek ji Siltanê Fîlan re gotin. Her ku
wî behsa welatekî gêrîkan dilcir, Siltanê Fîlan ji kêfan difiriya.
Her ku Serkumikê Berz behsa gêrîkên sor, jîn, turuncî,
kesk, mor, zer dikir, Siltên ji kêfan xortima xwe mîna beştekî
ber bi ezmên ve bilind dikir û heta ewran dirêj dilcir.
- Baj e, baş e, ez ê tavilê derkevim sefera hemû welatên gêrîkan...

Serkumikê Berz ji kêfan bang kir:
- Raweste, Siltanê min. Hela raweste. Bêhna xwe piçekî fireh bike.
Siltan keniya û got:
- Ez ê çawa bêhna xwe fireh bilcim! Gava mirov bikaribe hemû welatên gêrîkên dinyayê têxe bin destê xwe, mirov çawa dilcare bêhnfireh be...
- Raweste, Siltanê min. Hebelcî aram be, ez ê çend gotinan ji te re bibêjim.
Siltên kêfa xwe anî û got:
- Bibêje. Tu çi bibêjî, tu rast dibêjî. Ez ê serayekê û textekî jî ji te re bidim çêkirin.
- Ez ne text û ne jî serayê dixwazim, Siltanê min. Ger tu dixwazî ji min re...
- Bibêje, ez ji te re çi bidim çêkirin?
- Ji min re hêlînekê bide çêkirin ku...
- Ez ê ji te re hêlînekê li ser dareke çinarê ya pir mezin û muhtejem bidim çêkirin ku... Ew ê dareke weha bi efsûn be ku dareke çinarê ya ku mirov çi qas bixwazin jahrê bidinê, bila bidinê, mirov çi qasî ava nepaqij bidinê, bila bidinê, ew ê dîsa jî nerize. Ne bivirên wan dê bikaribin vê darê bibirin û ne jî agirê wan dê bikaribe wê bijewitîne.
Serkumikê Berz bi kêf perwaz da ûgot:
- Ew ê nikaribin bijewitîne.
83
- Nuha ji min re bibêje, gotina te ya ku te dixwest, tu ji min re bibêjî, çi ye?
- Li min baj guhdarî bike, Siltan. Qet tu pêwîstî tune ye

ku em bi vî lajê te yê girdo mirdo bigirin ser welatên gêrîkan.
- Hella, hella, wê gavê ez ê ew qas welatan çawa têxim bin emirê xwe? Qet nebe, ew gêrîkên ku dê têkevin bin emirê min, divê min bibînin, ne weha?
Serkumikê Berz got:
- Qet ne pêwîst e.
- Tu ê çi bilcî, ji min re bibêje, Hudhudo?
- Li min guhdarî bike, Siltanê min, ez li nav mirovan geleki mam. Ez ji wan fêrî gelek fen û filtan bûm ku ez ji te re dibêjim fen û fiît.
-Êêêê?
- Ez ji begê xwe re bibêjim, nuha, ez ê ji gêrîkên me, bi qasî panzdeh- bîst heban li pijta xwe bikim û têkevim rê. Gêrîkê dilqecêb jî dê di nav van gêrîkên ku ling, simbêl û teriyên wan jêbûyî û zikên wan qelajtî de be. Ez ê van gêrîkan li ser pijta xwe bikim û bifirim biçim welatê gêrîkan ê yekem. Ez ê van gêrîkên tijt di wan de nemaye li paytextê welatê gêrîkan deynim, ez ê hemû gêrîkên paytextî li meydanê kom bikim û ez ê halê gêrîkên me nîjanî wan bidim. Dû re jî ez ê ji wan re bibêjim ku de ji van hevalan re behsa fîlan bikin. Ew ê behs bikin ku bê welatê wan çawa di bin lingên fîlan de eciqî û hilwejiya... Pijtî wê, ez ê ji gêrîkên paytextî re bibêjim ku têkevin bin emirê me.
Siltên got:
- Ger nekevin bin emirê me?
Serkumikê Berz bi bawerî bersiv da:
- Ew ê têkevin bin emirê me.
Siltên dîsa got:

- Ger nekevin bin emirê me?
Silêmanê Dunikil got:
- Ger nekevin bin emirê me, ger ew nekevin bin emirê me, ez ê jî li wê derê fîlelcî ciwan peyda bikim. Ne pêwîst e ku mirov ji vira tu fîlan bibe. Ez ê wî fîlê ciwan biajom ser wî bajarî...
Siltên got:
- Bijî! Ev aqilê te, li ba mirovan hebûya, wan ê ne dinya û ne jî xwe weha bilewitanda.
- Serkumikê Berz got:
- Tu sax bî, Siltanê min.
- De biçe, rêya te velcirî be. Hêmû gêrîkên dinyayê bi min ve girê bide. Ez te bibînim.
- Pijtî ku li ba neteweyê te yê fîlan ev muhtejemî hebe, pir najo, hemû gêrîkên dinyayê di bin emirê te de ne, Siltanê min.
- Nuha, raste rast biçe welatê gêrîkan, tijtên ku em peyivîne, yek bi yek ji wan re bibêje... Dîsa ji wan re bibêje ku ez serayê jî bi lez dixwazim. Rêya te vekirî be.
- Tu her hebî, Siltanê min.
Serkumikê Berz firiya çû welatên gêrîkan, li wê derê çi qas ên kor û kût, pijtjikestî, simbêl jêkirî û perîjan hebûn, hemû civandin, li pijta xwe kirin û ber bi welatê gêrîkên rej ve firiya. Li ser rê, li dejtan, li daristanan, garan bi garan fîl didîtin û silavên Siltên li wan dikirin.
Rojekê, gava roj hatibû tajtiyan, Serokê hudhudan gîhajt welatê gêrîkên reş. Gêrîkên rej li meydana bajêr civandin û

gêrîkên perîjanbûyî ji ser pijta xwe daxistin û nîjanî wan
dan. Gava gêrîkên rej ev gêrîkên bê dest û pê û nîveciqî dîtin,
dilê wan pir bi van gêrîkan jewitî.
Got:
85
- Wax wax! Wax waaax, kê ev weha lcirine? Wax waaaax!
Serkumikê Berz ji rewjê îstifade kir û ji gêrîkên perîjanbûyî
re got:
- Ka bibêjin.
Gêrîkên perîjanbûyî dest pê kir, ji wan re mîna ku mirov
ta bi derziyê veke, behsa wê roja xerab a ku welatê wan, bajarên
wan ketibûn ber êrîjê kir. Behsa wan fîlên ku mîna xezebekê
li dinyayê digerin û mîna çiyayekî rej bi ser bajêr û welêt
de ketibûn ku bi her gavavêtineke ve bi hezaran gêrîk dikujtin,
mal xera dikirin û ûcax ditefandin, kir. Wan got û
gêrîkên rej giriyan, gêrîkên rej giriyan û wan got. Di dawiyê
de, Serokê hudhudan pijtî ku li ser serê meydanê firiya û
heft caran li dora wê çû û hat, dest bi peyvê kin
- Va, we ev dîtin û ji serî heta binî li van guhdarî kir. We
baj fahm kir ku bê fîl kî ne?
Rawestiya, ji bo ku xwe hebekî din nêzîkî wê qelebalixiya
gêrîlcan a ku li jêr tev de diçû û dihat bike, baskên xwe sist
kirin.
- Nuha, li min baj guhdarî bilcin, Siltanê Fîlan artêja xwe
amade kiribû û dikira bihata ser we. Welatê we jî dê bûbûya
wek welatê van gêrîkên perîjanbûyî. Min ew Siltanê mezin û
muhtejem da rawestandin, min got ku gidî Siltanê min raweste.
Wî got ku ez ê ji bo çi rawestim, ey birayê min î Serkumikê

Berz. Min ji Siltên re got ku tu ê ji ber vê sebebê raweste;
hemû gêrîkên ku li vê dinyayê dijîn, di emirê te de ne,
ji ber vê yekê, tu ê ji bo çi gêrîkên ku di bin emirê xwe de bikujî.
Wî kêfa xwe anî û got ku tu rast dibêjî, ez ê ji bo çi gêrîkên
qûlên xwe yên ku di bin emirê xwe de ne, bikujim.
Min ji wî re got ku wê gavê ez ê biçim welatê gêrîkên rej û
emirê te yê mezin bigihînim wan, da ku ew ji gotina te dernekevin.
Nuha, li min guhdarî bikin û hem jî nebêjin me ne
bihîst, ez ê fermana Siltanê Fîlan ê pir mezin bixwînim.
86
Serokê hudhudan bi qasî ku deng biçe bajêr gijî, ji jorê bi
dengekî bilind fermana Siltanê Fîlan ji gêrîkên rej re xwend.
Di xwendina cara yekem de, gêrîkên rej ji fêrmanê tu tijt
fahm nekir. Serkumikê Berz fêrman careke din ji wan re
xwend.
- We fahm kir?
Gêrîkan dîsa tu tijt fahrn nekiribû. Serokê hudhudan bi
dilekî fireh û bi sebir, fêrman dîsa xwend, heta êvarî çû û hat
û ferman xwend, lê gêrîkan dîsa tu tijt ji fermanê fahm nekir.
- We fahm kir bê Siltan çi dixwaze?
- Me fahm nekir.
- Tijtekî ku neyê fahm kirin, tune ye, hûn ê ji Siltên re serayekê
ji yaqûtan û textekî ji almasa pembe çêbikin û embarên
wî jî tije xwarin bikin. Çi ji vêya nayê fahmkirin?
Gêrîkan got:
- Pir zor e, pir zor. Em ji vê fermanê qet tu tijtekî fahm
nakin.
Silêmanê Dunikil got:

- Wê gavê, baj e, hûn ê di nêzîk de, weha fahm bilcin ku...
- Gêrîkan bi hevdu re bang kir:
- Em falim nakin. Em ji zimanê filan fahm nakin.
Serokê hudhudan daket erdê, gêrîkên perîjanbûyî yên ku
wî ew danîbûn meydanê bi hêrs li pijta xwe lcirin û ber bi
daristana ku hebelcî ji wan wê de bû firiya. Li wê derê, garaneke
fîlan rawestiyabû. Fîlan xortimên xwe ber bi hewa ve
bilind kiribûn û ji ezmên tijtekî ku dijibiya fermanê dipan.
Silêmanê Dunikil got:
- Ma hûn li benda min in?
Fîlan got:
- Em li benda te, li benda te ne. Emirê te li ser serê me ye.
- Heydê, em bigirin ser welatê gêrîkên rej. Li wî welatî,

divê ne kevir li ser kevirî bimîne ne jî tu benderuh sax bimîne.
Fîl ketin rêya welatê gêrîkan û di demeke kurt de, xwe gîhandin
welatê gêrîkên rej û dest bi jer kirin. Gêrîkan ji gava
ku ev dinya bûbû dinya û heta nuha, hengameyeke weha nedîtibû.
Erd dihejiya, diqelijî, ezman dilcir çirke çirk û dihat
xwarê. Li ser serê welatê gêrîkan çivîk jî nedifiriyan. Heta ku
roj çû ava, bi milyaran gêrîk di bin lingên fîlan ên girs de
eciqîn. Yên ku ne eciqîbûn, hatin ba Serkumikê Berz û xwe
avêtin wî û got:
- Ma tu behsa fermana Siltên dilcî, behsa fermana wî Siltanê
Fîlan ê pir mezin dikî? Me ew, gotin bi gotin fahm lcir.
Em hîn ji berê de, bi fîlî dizanin. Di esilê xwe de, esil û fesilê
me fîl in û esil û fesilê fîlan jî gêrîk in. Me bawer lcir, me
îmana xwe pê anî.

Kêfa Serkumikê Berz pir ji vêya re hat û xebera serkevtinê ya yekem gîhand Siltanê Fîlan:
- Ev gêrîkên rej nesilekî weha ye ku her yek ji wan bi qasî sed gêrîkî xurt e.
Zikê Siltanê Fîlan jî ji kêfa bilind bû û daket:
- Ox ox ox, baj e baj... Tavilê bifire û biçe welatên din jî û fermana min bigihîne gêrîkên zer, kesk û sor jî. Gêrîkên siwarî jî ji bîr neke. Li vê dinyayê çi qas welatên gêrîkan ên ku em pê dizanin û nizanin, hemuyan têxe bin emirê min! Ji bo vî karî, hemû fîlên dinyayê di bin emirê te de ne, ji bo vêya xeber gîhajtiye hemû fîlan.
- Bi xatirê te, Siltanê min.
- Bila rêya te vekirî û jûrê te tûj be.
Serkumikê Berz vê carê jî firiya û çû welatê gêrîkên turuncî û ew jî di demeke kurt de, xistin bin emirê Siltên. Dû re, yên sor, dû re yên kesk... Di demeke kurt de, hemû welatên gêrîkan bi Siltên ve girêdan. Bi taybetî, li Asyayê, li Afrîlcayê
88
nesilin gêrîkan, welatin gêrîkan peyda kirin ku navên wan qet nehatibûn bihîstin û hayê tu kesî ji wan tune bû. Marîfetin van gêrîkan hebûn ku gava Siltên ew bihîstin, ji kêfa, tu nema bû ku bask bi wî lajê xwe yê girs vekira û bi hudhudan re bifiriya...
89
ÇAR
Siltanê Fîlan dibe padîsanê gêrlkan û dikeve seraya xwe ya ku gêrikan bi hûrbijarî ava kiribû. Li ser textê xwe yê ku gêrfkan ew ji orta dinyayê derxistibû û terişandibû rûdine.

Textê wî stn dibiriqand û mlna ku bi hezaran sitêrk li hevdu kom bûbûn, bi sev û bi roj vêdiket û bi sewq diçûrisî.
Gêrîk ber bi çiyayî ve dikijiyan û seraya li ser çiyayî li ber qedandinê bû. Rê, hêsar, zinar, daristan bi gêrîkên ber bi çiyayî ve dikijiyan rêz bi rêz... Gêrîk di bextiyariya hewildaneke talî de bûn. Ew ê çawa ne bextiyar bûna, li dinyayê cara yekem, wan ji Siltanê Fîlan re, ji mezinê mezinan re, ji muhtejemê muhtejeman re, seray çêdikir. Ma karekî hindik e? Westiyan, çirilca wan derket, lê xem nake. Di demeke nêzîk de, gava ev seraya krîstal ya xwejik biqede, ew ê hemû zehmetiyan ji bîr bikin. Kî dizane, bê Siltanê Fîlan ê pir mezin ji ber vê serayê dê çi qas bextiyar bibe!
Gêrîkên ku dinya ji heft deveran qul kirine û xwe gîhandine zinarên almasên jîn ên orta dinyayê jî bextiyar bûn. Di esilê xwe de, mexlûqên ku cara yekem xwe gîhandibûn tam orta dinyayê, ew bûn. Ên ku xwe gîhandibûn orta dinyayê û ew zinarê almasê ya bi qasî ku mirovî nikarîbû çavên xwe li ber vekira dibiriqand û jewq dida peyda kiribûn, ew bûn. 0 ew bûn ên bi perçeyên ku ji vî zinarî birîbûn, dê ji Siltên re textekî weha xwejik çêbikira ku ji roja dinya ava bûye û vir de, tijtekî weha ne hatibe dîtin. Ji ber vê xwejikbûnê, heta dê girêz ji devên siltanên mirovan jî biçûya. Bextiyariyeke weha mezin diket destê nesilê kîjan mexlûqî...
90
Gêrîkên ku li herçar aliyê dinyayê, li dejt, daristan, çiya û bexçeyan yek bi yek geriyabûn, dev ji piçelcî tahmkirinê berdin, bêyî ku bêhn bike jî xwarin ji fîlan, hudhudan û ji gêrîkên zerî re, kom dikirin jî bextiyar bûn. Ma yên ku H her deverên

dinyayê qul bi qul digeriyan û firîkên zadan, nava kulîlk, dar û kêzikan derdixistin û embarên fîlan heta ber dev bi îlcsîrê dadigirtin, ne ew bûn? Eniya van mexlûqên muhtejem, a van Xwedayên gêrîkan ên nuh dê ji ber van reftariyên wan hilmijtî ba û belkî wan ê ji ber vê serbilindbûnê, nikarîba hisên xwe kontrol bilcirana û her gêrîkek bilcira fîlelcî pir mezin. Diviyabû ku gêrîkan heqê wê xebata xwe ya ku wan digel hemû dijwarî û talûkeyan dikir, bistenda.

Embar bi genimê sorgulê safî, bi berberojan, gilgilan, sêvan, gulan, bîhokan, hebirmanan, nava kulîllcan, hunguv, tirî û hejîran ve mijt bûn. Gêrîkên xwarin berhev dikirin, bi cehdeke weha li dinyayê geriyabûn û xwarin kom kiribûn ku di embarên fîlan de mirov çi bixwesta hebû, bi tenê jîrê teyran tune bû. Ger ew jî peyda bûbûya, bi çi awayî ba, wan ê ew jî bikijanda embaran. Gêrîkên dinyayê di warê avakirina serayê û çêkirina textê ji almasa jîn de, bi hevdu re ketibûn qayijê. Hemû derdê wan ev bû ku wan dixwest têkevin çavên Siltanê Fîlan û Serokê hudhudan.

Heta, ew Siltanê Fîlan ê pir mezin, Xwedayê gêrîkan ê nuh bi wan re jî dipeyivî.

Ji wan re digot:

- Hûn çawa ne, qûlên min ên gêrîk?

Leee, ji wan re digot:

- Hûn çawa ne, qûlên min ên gêrîkên delal? Ger hûn weha bixebitin, di demeke nêzîk de, her yek ji we dê bibe fîlekî muhtejem û hûn ê jî wan gêrîkên piçûçik bi rê ve bibin. Ger hûn nexwazin wan îdare bilcin, hûn dikarin bixwin, vexwin û li daristanê ji sibehê heta evarî, qûnên xwe di dara herî me-

9i
zin de bidin û bixurînin. Ev dinya dê ji we re bibe bihujt. Bi tenê rîca min a ji we, ev e ku ji bo Xwedê, hûn ê wek fîlên din nekin. Gava we qûnên xwe di daran de dan û we ew bê rawestan xurandin, ji bo xatirê Xwedê, hûn ê nekevin ber hevdu û jer nekin. Herkes jî hemû mexlûq jî li halê wan û li jerê wan dinihêrin û dibêjin qey li welatê fîlan ê bextiyar, rewş xerab e. Halbûki, welatê fîlan...
Aaax, ger gêrîk bûbûna fîl, ma wan ê mîna fîlên gewî qet şer bikira? Ew ê di bihujta fîlan de, çi qas xwej, çi qas milahîm bijiyana, aaax, ger gêrîk bûbûna fîl, aaax... Wekî din jî ma wan ê sal duwanzdeh meh, hertim qûnên xwe di daran de bidana û ew ê li ser pijtê veketana? Ew ê her bixebitiyana. Hela bila her yek ji wan bibe fîlek, hela hela... Ger ew bi qasî fîlan xurt bin, ma ev dinya dê weha be? Gava gêrîk bi qasî fîlan girs û bi hêz bin, ew ê vê dinyayê ji serî heta binî biguherînin û li dinyayê çi qas mirov, hesp, deve, moz, gur, fîl, gêrîk, rêvî, wawîk hebin, ew ê hemû mexlûqan bikin hêsîr û koleyên xwe... Hemû mexlûqên dinyayê yên herî piçûk, zîro jî, pinpinîk jî dê ji wan re bixebitin. Aaax, Ger gêrîk carekê bûbûna fîl, ma ew ê fîlin weha, mîna van fîlên ehmeq bûna, aaax! Hela bila ew seray û wî textê ji almasa jîn biqede, hela bila Xwedasiltan carekê tekeve seraya xwe û li ser textê xwe rûne, hela bila ew wê îlcsîra xwe ya ku ji nava kulîlkên sed hezar bexçeyî hatiye derxistin, vexwe û serxwej bibe, hela bila carekê... A wê gavê, dibe ku kêf û heyecaneke mezin Siltanê Fîlan bide ber xwe û ew bi vê kêf û heyecanê qûlên xwe yên gêrîk bike fîl.

Gêrîk li van hemuyan difikirîn û bê rawestan dixebitîn, binê erdê dikolan û ji çiyayên almasan taht dibirîn, dianîn û piçik piçik datanîn ser hevdu û seraya krîstal bilind dikir. Çiyayan li hember vê evînê, vê hewesê û vê cehdê nikaribû xwe bigirta. Dinya heta ku çav çavan bibîne, bi gêrîkan ve

hatibû dagirtin. Mexlûqên dinyayê yên din, çivîk, kêzik û heywanên din, li hember piraniya van gêrîkên ku dinya ji serî heta binî, bi xwe seyandibû, jaj mabûn. Sitîmakê ji bo fîlan, bê rawestan gêrîk dianîn dinyayê. Tu nema bû ku li dinyayê, pijtî bîstikekê, ji gêrîlcan cîhê ku mirovî bikarîba xwe tev bilivanda jî nemabûya. Gêrîk jî ji bo qedandina serayê û çêkirina textî bi hevdu re ketibûn qayijê. Dinyaya gêrîkan a pir mezin ji hal de ketibû û bêhna wan bi zorê derdiket. Hîn piçeke tarî mabû, Iê dinya hema hema dilcira rohnî bûbûya. Li serê çiyayelcî, ronahiyeke mîna topeke pir mezin ji nijka ve xuya bû û teqiya. Dejt, çiya û av rohnî bûn. Ji ser qotê çiyayî lehiyeke ronahiyê ya ku bi guve guv diherikî ku vê ronahiyê xwe bera nav axê, devera daristanê ya herî xewle, kok û qalikên daran û nava zinaran dida.

Hemû dinya bi vê ronahiyê, bi awayekî jajmayî jiyar bûbû. Mexlûqan ziq li qotê çiyayî dinihêrî û lal mabûn. Hem bala fîl, hudhud, qertel, teyrên baz û kulemaran; hem a qertelên sor, gur, rêvî, jêr, piling, hesp, kergeden, wawîk, lcarxezalên çavkilkirî, pezkovî û jûlan; hem a gakoviyên bakurî, deve, qaqlîbaz û albatrosan; hem a hemû çivîkên rejahî û deryayê û mirovan û hem jî ya xort kal, alim û zarokan ketibû ser vê ronahiya ku ji ser serên çiyayan derdiket û diherikî.

Kêz û pinpinîkên ku di bin lehiya ronahiyê de pijta wan dibiriqî,
qalikên wan ên hijk mang dida û bi bask û gewdeyên
xwe sor, zer, kesk, mor û turunciyê wek gwîzanê dida ber
xwe û dibirî, diçûrisîn jî hatibûn temajeya vê ronahiyê. Ronahiyeke
weha ji ku û çawa dipejiqî û dihat!
Dar û avên ku di nav vê ronahiyê de mabûn, dibiriqand û
jewq dida... Û ji nijka ve, di ser vê lehiya ronahiyê re, lehiyeke
jîn a ku mîna brûskê, mîna gwîzên ku xwe di nav êgir re
derbas dikir û jewq jê diçû û xwe bera ser lehiya ronahiyê di-
93
da, xuya bû. Xetên jîn, tûj û birelcî...
Çivîk li ezmanan, li ser vê lehiya ronahiyê, li ser vê brûska
jîn a wek gwîzên a ku di tariya ber destê sibehê re derbas bûbû,
bask bi bask bûn... 0 mexlûqên li erdê, bi çavên xwe yên
ku ji ber ronahiyê venedibûn, li kêlelca hevdu, li ser hevdu...
0 mirov ji ber vê rewja ku çêbûbû, gêj bûbûn...
Siltanê Fîlan jiyar bû, çavên xwe paqij kir û li ezmên nihêrî.
Ezman ji hudhudan turuncî xuya dilcir. Çavên wî ber bi
aliyê rojhilatê ezmên ve dageriyan, wê derê jî ji qertelên sor,
spîsor xuya dikir, li aliyê rojavayê ezmên nihêrî, wê derê jî ji
papexanan safî jîn xuya dilcir, safî kesk, safî sor, safî turuncî,
safî morê papexanî...
Bajûr ji aliyê çivîkên rengareng ve hatibû girtin, ezman hatibû
nixumandin. Ronahiyê bi lez û bê rawestan, xwe bera
ser xezalan, pezkoviyan, hespên kihêl û kerkedanên yekqiloçî
dida... Dinya, erd û ezman, hemû mexJûq, hemû nebat, zinar,
av û ax di nav ronahiyeke ku heta nuha qet nehatibû dîtin
de mabûn. Li ezmên jînelcî safî di nav vê lehiya ronahiyê

ya ku xwe bera xwarê dida, li ser serên av, çiya û daristanan, mîna ewrelcî nerm û fireh diçû û dihat. Bi xetên tûj wek gwîzên...
Siltanê Fîlan tavilê bangî Serokê hudhudan lcir:
-Ev çi ye, ev çi hal e, Serkumikê Berz? Çi bi vê dinyayê bû, birayê min, hemû mexlûq li erd û ezmên belav bûne, tu li jêrê binihêre, heta wan ên hayê wan ji tijtekî çênabin jî serî hildaye, ev çi hal e, ma nenormaliyek heye?
Devê Serokê hudhudan çûbû paj guhên wî.
Got:
- Belê, Siltanê me, hem jî nenormaliyeke weha heye ku dinyaya me nenormaliyeke weha, tu carî nedîtiye... Li wira binihêre.
- Ez li ku binihêrim?
94
- Li wira, tam li qotê çiyayê bilind...
- Ez lê dinihêrim, çavên min venabin.
- Li ronahiya jîn, a safî jîn binihêre.
Siltanê Fîlan lê nihêrî û ew dît. Ji ber kêfa ku bi vê xwejikbûnê pê re çêbûbû, tu nema bû ku dilê wî rawestiya. Kembereke jînê safî, xwe li hawirdora seraya krîstal ya ku diçûrisî pêçabû..
- Zû, gêrîkan bîne ba min!
Serkumikê Berz hema tavilê bi hivdeh hudhudên din re firiya, çû bajarê gêrîkan û xwe li meydanê danî.
Got:
- Bilezînin, Siltan we dixwaze.
Hem mezinên gêrîkan û hem jî Sitiya westiyayî ya ji ber

ku îsal bi milyonan gêrîk anîbûn dinyayê, hal tê de nemabû,
ji xwe kincên xwe li xwe kiribûn û li benda wî bûn. Li ser
baskên hudhudan civiyan û hatin ba Siltanê Fîlan.
Sittan rabû ser xwe, çû pêjiya wan û got:
- Hûn bi xêr hatine, hevalno. Hûn birayên min ên avakar
û afirandêr in. Ji bo merasîma vekirina serayê, ez we hemuyan,
hemû gêrîkên qûlên xwe dawet dikim. Bila hudhud bêyî
ku we ji pijta xwe deynin, bibin wê derê. Ez ê ji bo yên
din jî emir bidim, hemû gêrîkên ku keda wan ketibuyê dê
bejdarî merasîmê bibin.
Gêrîkê dilqecêb:
- Hemû gêrîk li serayê, li dora textî ne, em li bajaran mabûn
û li benda emirê Siltanê xwe bûn. Gêrîkên ku hem seray
û hem jî textê jîn çêkirine, ji do bi jev ve, li wê derê rawestiyane
û nikarin çavên xwe ji ser seray û textê ku wan çêkirine,
dagerînin. Li wê derê, xwejikbûna seray û textî hijên
wan ji serên wan birine.
Siltanê Fîlan got:
- Wê gavê, baj e.
95
Mirov digot, qey ji kêfa baskên wî çêbûne, ew lajê wî yê
girs wek perîkan sivik bûbû. Hemû fîlên xwe civandin û tevî
hudhudên xwe yên ku bask bi bask li ser serê wî difiriyan,
berê xwe da seraya xwe.
Hemû mexlûq, hemû gêrîk, hudhud, çivîkên din, kêzik,
heta mahjot jî hatibûn merasîmê. Bi tenê mirov ne xuyabûn.
Serokê hudhudan, Serkumikê Berz peyivî:
- Nebî nebî, ha! Xebera vê merasîma îroj nedin mirovan.

Em çibikin bikin divê hayê mirovan ne ji serayê, ne ji textî û
ne jî ji merasîmêş hebe. Ez mirovan pir baj nas dikim. Di nav
wan de, Silêmanek hebû, bi zimanê hemû mexlûqan dizanîbû,
yekî efsûnger bû, em ji dema wî û vir de, bi mirovan re
bûn yek. Min ji gava ku ew nas kirine, wan bêvila xwe xistiye
kîjan karî, ew kar herimandiye. Mexlûqin pir pesnê xwe
didin, ger tijtekî bilcin, hezar carî dipesinin. Dû re jî xwe
wek kilîda kaînatê dihesibînin. Hemû jî pir hindik dîn in.
Dû re jî ew mirov ne mîna me ne, ew fanî ne. Bi fanîbûna
xwe hisiyane û ji ber mirinê dîn bûne. Ji ber vê yekê, ji xwezayê,
ji xwe, ji sitêrlcan û ji hertijtî nefretê dilcin. Hezkirin li
ba wan nemaye. Hezkirin ji bîr kirine, germahiya xwe ya jiyanê
wenda kirine. Nuha, ger ew vê serayê û vî textî bibînin,
ew ê an hilwejînin, xera bikin û bi erdê re bikin yek, an jî
hertim bifirojin hevdu. Vê seraya te ya xwejik, vî textê te yê
muhtejem dê ji bo wan, bi tenê bibe wasiteyeke firotinê...
Ew bi hezkirineke germ a ji dil û can, nilcarin li xwejikahiyekê,
li hudhudeke mê, li qubeqazekê, li xezalekê binihêrin.
Çavên Siltanê Fîlan jî ji ber tirs û jajmayinê, dikira ji serê
wî baz bida û emirê xwe yê qet'î got:
- Divê mirov, cîhê seraya min jî qet nizanibin. Hudhudê
efsûnger bijîne, bila çavên hemû mirovan girê bide. Ez dizanim,
ez jî dizanim ku ev mexlûqên mirovan hertijtî diheri-
96
mînin. Xwedê tu mexlûqan nejibîne wan. Xwedê tu mexlûqan,
li hember mirinê, mîna wan dîn neke. Ez dizanim, ji
çêbûna wan û heta mirina wan, karê wan ev e ku ew ji xwe,
ji mirinê û ji rastiyê direvin. Û ji vê revê, ji tirsan, çi bikeve

ber wan ji ortê radikin...
Merasîmê dest pê lcir. Sittanê Fîlan derket ser rasteka zinarê li pêjiya serayê yê ku bi qasî cîhê pênc apartmanan mezin bû. Berê, xortima xwe ber bi ezmên ve rep kir, dû re rabû ser lingên xwe yên dawiyê û lingên xwe yên pêjiyê ber bi ezmên ve bilind kirin. Bû gin gina wî û demekê dua xwendin. Gava duayên wî qediyan, xortima xwe dirêjî mexlûqên ku dejta jêrê û palên çiyayî di ber hev de dagirtibûn, Icir û dû re dîsa ber bi jor ve bilind kir. Ezman bi çivîkan ve hatibû nixumandin, devereke piçûk jî xuya nedikir.
Bedena Siltanê Fîlan a spîboz wek berfê, ya ku îro di bin vê lehiya ronahiyê de ji her demê bêtir spî xuya dilcir, çavên mirov ditirsandin.
Siltên dest bi axavtina xwe lcir:
- Mexlûqên berêz, delal û muhtejem, birayên min, min hûn bi serbilindî dawetî vê roja xwe ya bi kêf û bextiyar kirin, hûn bi xêr hatine. Mexlûqno, ez dibînim ku li ser daxw; iza min, herkes hatiye. Hûn sax bin, her hebin... Bi tenê, mirov ji vê civînê kem in...Tu kesî ji we, ji min nedixwest ku ez wan dawetî vira bikim, ne weha?
Hemû mexlûqan bi hevdu re bang kir:
- Me nedixwest!
Mirovên ev dengê xurt û bi jidet bihîst, got ku qey dengê ewran e.
- Ev mirov jî wek me, wek hemû mexlûqên din nefspiçûk bûna, her yekî ji wan, xwe Xwedê nehesibanda, dû re, ev Xwedê ji tirsa xwe, ne cehimiyana û ne bûna cenawir, ji bo ku me ew jî dawetî vê roja bextiyar ne kiriba, dê tu sebebek

nemaba.
Hemû mexlûqên din bi hevdu re bang kir:
- Dê nemaba!
Mirovan got ku qey ev dengê ewran e û guh nedanê.
- Mirov pir dejenere bûne, ji dinyayê û ji mexlûqan bi dûr ketine.Tirsa mirinê ew mahftcirine. Ji ber vê tirsê, serê xwe li viyalî û wiyalî li tahtan dixin. Her ku lê dixin, aqilê xwe wenda dikin. Gava ku mirov rojekê bibin gêrîk, roja ku bi qasî gêrîkan nefspiçûk bibin, roja ku hevdu nexwin, ew ê xwe rizgar bikin...
Hemû mexlûqên din bi hevdu re bang kir:
- Ew ê xwe rizgar bikin!
Mirovan ev giregir jî bihîst û dîsa got ku qey ev dengê ewran e.
Siltanê Fîlan gewriya xwe paqij kir û dîsa dest pê kir:
- Belê, birayên min ên berêz, mirov ecêb in, ji gêrîkê dilqecêb jî xerabtir in. Ji ber ku qanûnên wan mirovan xerab in. Dibêjin ku yek dixwe, hezar lê dinihêre û qiyamet jî ji vê çêdibe, Iê ew qiyameta ku ew li benda ne, bi tu awayan nayê. Hezarê wan dixebitin birçî dimînin, deh hezar, sed hezarê wan dixebitin birçî dimînin, yek, bi tenê yek dirijîne û dixwe, heta ku di dev û bêvilê re biavêje dixwe, dîsa têr nabe. Her carê tijtekî derdixînin, nuha hemû lcarên wan ev e ku tijtê ku bi pêncan dikirin, bi dehan difirojin. Zeviyan dikirin û difirojin, daran, delavan, mirovan, çi bikeve destên wan, diyên xwe, bavên xwe, zarokên xwe, jinên xwe, çavên wan li vê kaînatê bi çi kevin, dikirin û difirojin. Keviran,

stêrkan, zêran, almasan, kulîlkan, dilên xwe, çavên xwe dilcirin
û difirojin... Mirov bi dînîtiya Icirîn û firotinê ketine ku
ez ji we re dibêjim dînîtî... Di kaînatê de, çi peyda bikin, dilcirin
û difirojin. Baweriya we hebe, birayên min ên mexlûq,
ev mirov ji Gêrîkê me yê dilqecêb jî ecêbtir in. Ev dînîtiya
98
kirîn û firotinê dê belayekê bîne serê wan, ev ê hey bibe, lê
ger zerara vê, negihêje me mexlûqan jî... Ev kirîn û firotina
wan a hertijtî, ev dînîtiya wan, di nav dînîtiyên wan yên ku
heta nuha hatine kirin de, dînîtiya herî xerab e. Bi pêncan
kirîn û bi dehan firotin, dê belayekê bîne serê mirovan û serê
dinyaya me. Xwedê me û dinyaya me ji jerê mirovan bisitrîne.
Hemû mexlûqan bi dengekî bilind got:
- Amîn!
Mirovan ev jî dengê ewran hesiband.
Siltanê Fîlan axavtina xwe domand:
- Nuha, em dev ji mirovan berdin. Ji xwe, Xwedê bela
wan daye wan. Ger weha biçe, qet tu xêra wan, li dinyaya
me û li kaînatê tune ye. Em nikarin ji xerabiyê û pê ve, tu
tijtekî ji wan hêvî bikin. Nuha, peyva min ji bo we ye, birayên
min ên esîl û muhtejem. A hûn vêya dibînin, ev seraya
ku qûlên min ên gêrîk ji min re ava lciriye, tu mexlûqan ji
siltanên xwe re çênekiriye. Ancax, gêrîk dikarin serayeke weha
ji siltanên xwe re çêbikin. Mirovan ji siltanên xwe re, ne
seray, ne ehram, ne bexçeyên wek ên Babîlê û ne jî abîde çêkirine.
Tu kesî ji wan, nikarîbû serayeke wek seraya ku gêrîkan
ji bo min, ji bo Siltanê we ava kiriye, çêbikira. Nuha, li
vê dinyayê seraya herî xwejik, seraya min e, seraya Siltanê we

ye. Ji gava ku dinya ava bûye û heta nuha, tu kesî textekî wek vî textê ji almasa jîn ku hûn dibînin, ji tu siltanî re û ji tu Fir'ewnî re çênekiriye. Yên ku dinya qul lcirin û ji orta wê, kevirê vî textê ji almasê yê efsûnkirî derxist ser ruyê erdê, bi tenê birayên min ên gêrîk in. Yên ku ev seraya ji belûrê, ji min re, Siltanê we re lê kiriye, bi tenê birayên min ên gêrîk in. Min ji ber vê sebebê, hemû mexlûqên dinyayê dawetî vê merasîmê kirin. Min bangî qewmê mirovan bi tenê nekir, wan mexlûqên neyînî, ên ku her deverê dijewitînin û hildi-

99

wejînin, ên ku çavên wan têr nabin, ên ku tim û tim pir xerabiya nedîti bi hevdu dikin... Qewmê mirovan hem ji bo mirovatiyê û hem jî ji bo dinyaya me, bû felaketek. Pijtî ku qewmê mirovan dest bi vî lcarê kirîn û firotinê kir, xusûsiyetên xwe yên mirovatiyê wenda kirin. Li ser ruyê erdê, hertijt kirî û firot. Erd kirî, firot, erdê erdbûna xwe wenda Icir. Avê avtiya xwe wenda kir, daristanê daristanbûna xwe û ezmên ezmantiya xwe wenda kir. Ew ê di demeke nêz de, heyvê û sitêrlcan jî bikirin û bifirojin, wê gavê heyv dê heyvtiya xwe û sitêrk jî dê sitêrkiya xwe wenda bikin.

Birayên min ên biesil, Xwedê tu kesi danexe cîhê mirovan, pijtî ku mirov bûn bazirgan, pijtî ku hertijt kirîn û firotin, ji mirovatiyê jî derketin. Mirovan dil lcirîn û firotin, dil ji diltiya xwe derket. Mirovan evîn, hezkirin, dostanî, biratî, ajtî, hevaltî, nêzîktî û xwejikahî Icirîn û firotin û ji mirovatiya xwe bi dûr ketin û weha bû ku êdî têrxwarinî li wan nema. Bi nexwejiya perehilanînê ketin. Birayên min, mexlûqên berêz, min ji ber ve sebebê, mirov îroj dawetî vê roja me ya

bextiyar nekirin. Ji ber ku ez tirsiyam, min ew dawet nelcirin. Ger ew vî textê jîn bibînin, ger çavên wan vê seraya ku jewqeke nedîtî jê diçe bibînin, ew ê illeh tijtekî bilcin û di cîh de, wan jî bikirin û bifirojin. Qet tu îmlcana wê tune ye, ew ê bikirin û bifirojin. Hingî ev text û ev seray jî ew qas caran dê bên firotin, ew ê bêyî ku bi kêrî tijtekî bên, kevin bibin, bijikên, mahfbibin û biçin.

Nuha, birano, em dev ji mirovan berdin, bila bêtarê wan di xizna wan de be. Eeem gêrîk, gêrîkên biesil û muhtejem, mexlûqên dinyayê yên herî xurt û hem jî afirandêrên herî mezin, girseyeke yekbûyî ya bê îmtiyaz û bê çîn in... Eeem gêrîk û fîl bi biratî, wekhevî, azadî û ajtî dijîn. Azadî di ser hertijtî re ye. Li mirovan binihêrin, ji ber ku wan bi qasî me gêrîkan girîngî neda azadî û wekheviyê û hem jî ji ber ku qet ioo

ajtî nexwestin, ketin vî halî. A azadiya nuha, sîstema me ya azadiyê dê heta qiyametê dewam bike. Di nav me de qet tu ferq tune ye. Ez vêya ji hemû mexlûqên birayên me yên ku li vê derê civiyane re, heta ji jehmar, zîro û kelmêjan re jî dibêjim, bila hemû kaînat jahida van gotinên min be ku her gêrîk fîlek e. Her fîl jî gêrîkek e. Binihêrin birano, ger her gêrîk ne fîlek bûya, ev seray dê çawa bihata avakirin? Her mexlûqê ku li vê serayê binihêre, dê fahm bike ku her gêrîk fîlek e. Ger her gêrîk ne fîlek bûya, ev kevirê efsûnbûyî dê çawa ji orta dinyayê bihata derxistin û textekî weha bihata çêkirin? Ne xwe, her gêrîk fîlek e. Mexlûqên berêz, ez ê sireke xwe ji we re ejkere bikim. Guhên xwe bidin min û li min baj guhdarî bikin.

Qelebalixa ku li Siltanê Fîlan guhdarî dikir, bi temamî bê deng bû. Ger mêj bifiriya, dengê baskê wê dê bihata bihîstin. Herkesî sira Siltanê Fîlan a mezin meraq lciribû.
- Berê...
Siltên li vira dîsa dengê xwe birî, çavên xwe yên piçûçik li ser qelebalixiyê gerand. Çivîkên ku li ezmên bask bi bask rêz bûbûn jî baskên xwe tev nelivandin.
Siltên dîsa dest bi peyvê kir:
- Berê... Berê, em jî, yanî fîl jî gêrîkên piçûçik bûn. Dû re, em xebitîn û me hewildaneke bêrawestan da û em bûn fîl. Ji ber vê yekê, gêrîkên pêjiyên me yên berêz, ez ê hem nuha û hemjî ji nuha û pê ve ji we re bibêjim, pêjiyên me. Ji ber ku hûn gêrîkên pêjiyên fîlan ên biesil in. A, em ji vî nîjadê gêrîkan ê biesil çêbûn û bûn fîl. Nîjadê gêrîlcan di ser her nîjadî re ye. Ew nîjad, ew nîjadê gêrîkan çi bextiyar e ku dilcare bi hewildaneke hindik bibe fîl! Xwedê nîjadê gêrîkan bisitrîne. Bala xwe baj bidin vê dinyayê çi qas pir gêrîk hene, çi qas, çi qas pir. Li vê dinyayê, tu nesilên ku ji nesilê gêrîkan pirtir, hîn bileztir zêde dibin tune ye û çênabe. Li gora ku her gêrîk
101
dê bibe fîl, nesilê herî xurt, ê kê ye? Ez ji we dipirsim, bersivê bidin. Li vê kaînatê, nesilê herî xurt, ê kê ye?
Dengê xwe birî, xwe ragirt, xortima xwe dirêjî ser qelabalixiyê kir û gerand. Ji nijka ve, mîna ku erd û ezman hejiyan, hem ji qelebalixa erdê û hem jî ji ya li ezmên gurmîniyek hat.
Siltanê Fîlan ji vê gurmîniya ecêb a wek ku topek biteqe, tu tijt fahm nekir. Heftê hezar mexlûq bi heftê hezar zimanî

bersiv dida Siltên.
Siltên bi awayekî hîn bi heybet û serbilindî dîsa pirsî:
-Kîîîîye?
Dîsa ji qelebalixiyê gurmînî hat.
Siltan boriya:
- Gêrîk!
Qelebalixiyê vê carê, bi zimanê fîlan bi hevdu re kir gurmînî:
-Gêrîk!
Siltanê Fîlan got:
- Belê, gêrîk, leee gêrîk!
0 ew sekinandin.
- Belê, lcî bi hemû hêza xwe, xwe bide kar û ji tune dest pê bike, bixebite û ji kaînata me re ubîdeyeke weha wek vê serayê çêbike, textekî wek vî textê jîn ê efsûnbûyî biafirîne, a ew her gav, her gava ku bbcwaze dikare bibe fîl.
Dengê xwe birî û bi kêf keniya. Guhên xwe bi jelp jelp li ba kir û got:
- Nuha, ez çi bibcjim hûn ê jî dubare bilcin... Her gêrîk fîleke!
Qelebalixê ji heftê hezar cîhî, bi heftê hezar dengên cuda dubare kir:
-Hergêrîkfîleke!
-Ji bervêyekê...
102
Heftê hezar celeb dengan bi hevdu re dest pê lcir:
- Ji ber vê yekê, hem li dinyayê û hem jî li kaînatê mexlûqên herî xurt gêrîk in.
- Gêrîk in!
- De bi hevdu re... fîlgêrîk, gêrîlcfîl, fîlgêrîk, gêrikê fî... gêrfîL.

fîlgêr... fîlgêr... fîlger...
Hemû bi hevdu re:
- Fîlgêr, gêrfîl... gêr... fîl... fîl... fîl... gêr...
Qelebalixiyê bê rawestan ev dubare dikir.
Gêrîk jî bi vêya bê hawe dipesinîn, êdî her yekî xwe fîlekî zirecêb dihesiband. Di vê rêyê de, gêrîkê herî rejbîn jî weha xeyal dikir ku qet nebe, sibehê gava ku roj hilê, destekî efsûnbûyî dê ew bikira fîlekî zirecêb. Her yek ji wan hudhudên li jorê, qertel, sîsarkên gurî, serçe, jirlcak, serxwînk, zilzilîk ji nuha de bûbû fîlekî firok. Li darê dinyayê kî naxwaze bibe fîl, ne weha?
Siltanê Fîlan pir xwej peyivîbû, dilên hemû mexlûqan, bi taybetî dilên gêrîkan fetih kiribûn. Nuha, wî ji bo pêkanîna daxwazên xwe, êdî dikarîbû emir bida gêrîkan. Bi dengekî qalind î bilind û emirwarî got:
- Daxwazeke min a din ji we heye, ey neteweyê gêrîkfîl..
Ez emir didim we ku hûn ê vê daxwaza min bi cîh bînin.
Ger ev daxwaza min pêk neyê, ev welatê me yê bextiyar li ser lingan namîne, bextiyariya me dirêj dom nake, birayên min ên gêrfîl...
Gêrîkan hemuyan bi hevdu re bersiv da:
- Her emirê te li ser serê me...
Mexlûqên din jî hemuyan bi hevdu re bersiv da, yanî gurmîniyeke wek ku top biteqe ji wan hat.
- Her emirê te li ser serê me ye. Tu Siltanê me... Her mexlûqê vê dinyayê dê di dawiyê de bibe fîl. Me li vê derê, ji vêya bawer kir û îmana xwe bi vêya anî.

- Mexlûqên berêz, hûn dengê xwe bibirin, ev pirseke me ya hundurîn e. Bi tenê gêrîkan elaqadar dike. Ji ber vê yekê, birayên me gêrfîlên din, divê hûn dengê xwe nelcin.
Gêrîkan got:
- Emirê xwe kerem bike, Siltanê me. Kerem bike, ger tu emir bikî, em ê vê dinyayê bibin ba rojê. Siltanê me, ger tu bixwazî, em ê rahêlin heyvê bînin vê derê. Em ji te re ji sitêrkan textekî çêbikin.
- Na na, tijtê weha nabe, hûn sax bin, birayên min ên gêrîlc Daxwaza min ew qas ne girîng e. Binihêrin, li min guhdarî bilcin, di vê roja bextiyar de, tijtekî piçûk heye ku min aciz dike.
Gêrîk ketibûn ber heyecaneke pir mezin, nikarîbû di cîhê xwe de rawestiyana:
- Ew çi ye, kerem bike ku em tavilê...
- Ew jî ev e ku Gêrîkekî Rîhsor hebû, dijminê min, dijminê hemû mexlûqan, tijtekî mîna mirovan bû... A îro, ez ji we, vî Gêrîkê Rîhsor ya sax ya mirî dixwazim. Vî Gêrîkê Rîhsor, ji ser pijta vî birayê me yê Silêmanê Dunikil, heqaret li min kir, dû re jî xwe ji ser wî baskî çeng kir û reviya. Ji wê rojê û vir de ye ku ez vî Rîhsorî an mirî an sax dbcwazim. Ev Gêrîkê Rîhsor hesinkerekî pir mezin bûye. Esilê wî digihêje heta Dawidê qiralên mirovan jî. Ne xwe, esilê Hesinkerê Rîhsor ji mirovan tê. We fahm kir bê çi qas bi talûke ye?..
Esilê vî Hesinkerê Rîhsor ji mirovan tê! Li vê dinyayê, ji vari rîhsorên dijminên azadiyê, ji derveyî wî jî gelek hene. Ev, gêrîkên ku dijminên azadiyê, dijminên dîn û wekheviyê ne. Ev gêrîk dijminên fîlan in. Ev dijminên hemû mexlûqên vê

dinyayê ne. Min di derheqê van de, gelek gelek agahdarî
wergirtin. Ev li ber deriyan jewqeyan jî dadiliqînin. Ev dijminên
namûsê ne. Ev nîjad esil, xwîn, urf, adet û dîrokê nas
nake. Li min baj guhdarî bikin, esilê van gêrîkên rîhsor ji în-
104
sanan tê. Peyva dirêj ne pêwîst e, ji bo kujtina wan hemuyan,
ma ne bes e ku ew ji esilê mirovan tên? Ev rîhsorên ku
ji mirovan tên, qet tu tijtî nekin jî ew ê fesadiyekê têxe nav
mexlûqan, nav gêrîkan, nav hemû mexlûqan, nav gêrîkan û
fîlan; ew ê wan bera ber hevdu bidin. Ew ê fêsadiya xwe ya
mirovî li kaînata me belav bikin. Ger ew ji ortê rabin, dinyaya
me dê paqij bibe. Gava ew rîhsor ji ortê rabin, gur û mîh
dê tev de biçêrin. Gava ew ên rîhsor ji ortê rabin, tu mexlûq
mexlûqê din naxwe. A nuha, ez berê ji gêrîkan, dû re ji mexlûqên
din, ji çivîk û mozan hemû rîhsoran an mirî an sax
dbcwazim. Herkes dê rîhsorekî an mirî an sax bîne û biavêje
vê meydanê... Yê ku wî Rîhsorê Hesinker, wî gêrîkê ku heqaret
li min kir, wî yê ku bi heqareta li min lcir heqaret li hemû
mexlûqan kir peyda bike û bîne, ez ê di seraya xwe de
odeyeke bidimê. Ew mexlûq dê heta mirinê, di wê odeyê de
bijî û zar û zêçên wî û hemû kesên ji sulaleya wî ne, dê heta
qiyametê bi hunguvê daran bêne xwedîkirin...
Bi qedandina peyva Siltên re, gêrîk, çivîk, hemû mexlûq li
dinyayê balav bûn û dest bi nêçîra rîhsoran kir. Wê meydana
ku Siltanê Fîlan nîjan dabû, di demeke kurt de, bi mirî û
zindîyên rîhsoran ve hat dagirtin.
Gava Siltên ew qas rîhsorên mirî, birîndar, zindî bi hevdu
re dîtin, kêfa xwe anî û emir da fîlên xwe:

- Biçin meydanê, marj! Hema a nuha, pê li wan rîhsoran bikin, miriyên wan jî zindiyên wan jî bieciqînin û ji ortê rakin...
Fîlan dest pê kir û di demeke kurt de karê xwe qedand û rîhsor ji ortê rakirin. Hemû rîhsorên li meydanê hatibûn civandin, bi rasteka zinêr ve hatibûn zeliqandin û êdî ji ortê rabûbûn.
Pijtî ku rîhsor ji ortê rabûn, Siltanê ku li rastekê dinihêrî, bîstikekê fikirî hema wê gavê hat bîrê. Ket taswasê:
105
- Le Rîhsorê Hesinker, le Rîhsorê Hesinker?
Deng ji qelebalixiyê derneket:
- Le Rîhsorê Hesinker?
Ji tu mexlûqî dengekî herî piçûk jî dernediket.
- Hesinker?
Serokê hudhudan hat, li dora serê Siltên sê caran zîvirî. Li dora serê wî sê xelekên turuncî çêkirin.
- Ew nikarin bipeyivin Siltanê min. Yê Hesinker ew esfiln kirine.
Siltan tirsiya û got:
- Le ger ew min jî efsûn bike? Le ew min jî efsûn bike û seray û textê min ji destên min bistîne?
- Gêrîk nilcarin fîlan efsûn bikin, Siltanê min.
Siltan hîn jî bêtir tirsiya. Ji tirsa, devê wî zuha bûbû.
Got:
- Lê esilê wî însan e. Ew însan...
Serkumikê Berz ket hundurê guhê wî û tijtin gotin, Siltan jî bi van gotinên wî yên bidizî, keniya û keniya. Bi destê xwe zikê xwe yê zirecêb ê spîboz guvajt û keniya.

- Êdî, bila mexlûqên din biçin û bi tenê gêrîkên me yên birader bimînin. Ji bo wan jahiyeke bi xwarin û vexwarinê heye. Deee, li tembûrê bixin û bi hevdu re dest bi kêf û jahiyê bikin.

Ji nijlca ve, ji dejt û çiyayan dengê çîve çîvên ecêb î efsûnkirî hat.

Siltanê Fîlan got:

- A, ev baj e.

Dû re jî bi qêrîn emir da:

- Deriyên sê embarên ku bi navilca kulîlkan, hunguv û kêzikê mirî ve dagirtîne, velcin. Bila pêjiyên me yên gêrîk, îroj zikê xwe têr bikin. Sê embar ji bo wan hindik in jî.

Ji nijka ve, hat bîra gêrîkan ku ew ji zû de birçîne. Ber bi

embaran ve reviyan. Gêrîkên berhevkar çi qas pir navika kulîllcan, hunguv, navika genim û kêzikên mirî anîbûn!

Gêrîk ketin embaran, sê roj û sê jevan xwar, vexwar û zikên xwe baj dagirtin. Ji zû de, xwarineke ew qas pir nexwaribûn.

Gêrîk minetdarî Siltên man, pesinîn û got:

- Li vê dinyayê, tu siltan û tu Xwedayê ku bi qasî vî Siltanî xêrxwaz û gêrîkhez be, tune ye. Wekî din jî ji sê nesilan bêtir gêrîk jî yên vî Xwedayî nin. Xwedê bela wî Hesinkerê Kulek î Rîhsor bide. Binihêrin, bê ji gêrîkan jî çi siltanên girs ku bi qasî dinyayê mezin, çi siltanên îlahî derdikevin.

Gêrîkên hemû welatan bi seray û textê ku çêkiribûn, bi gotinên ku Xwedasiltan ji wan re gotibûn, bi kêfa wê hêviya ku ew ê rojekê çawa be, bibin fîl, serxwej ketibûn û nikarîbû bi ser hijê xwe ve bihatana.

Vê rewja gêrîkan a serxwejbûnê tam sê mehan dewam lcir.
Gêrîkan tam sê mehan ji kêfa, pê li erdê nelcir.
107
PÊNC
Gêrikji Siltanê Fîlan re serayê ava dikin û textî çêdikin, lê ji
bîr dikin ku ji bo xwe nifqeyê Zivistanî hilînin û ji ber vê yekê,
birçî û xizan dimînin.
Gêrîkên westiyayî bi serbilindî vegeriyan welatên xwe.
Kêfa wan pir ecêb dihat. Ew ê çawa kêf nelcin, ji Siltanê
dinyayê yê herî bi hajmet re, seraya dinyayê ya herî xwejik û
mezin ava lciribû. Le textê ji almasa jîn? Bi milyarah gêrîk ev
almas ji orta dinyayê piçik piçik kijandibûn û li ser ruyê erdê
bi hevdu xistibûn. Her ku vî textî jewq dida, hemû dinya di
nav ronahiyeke jîn a xwejik de dima. Wan bextiyarî û pesinahî
dabûn siltanekî mezin.
Siltên dû re çi gotibû?
Gotibû:
- Her gêrîk fîlek e. Pêjiyên wan fîlên zirecêb jî pêjiyên
min jî û ez bi xwe jî em hemû gêrîk in. Gêrîkek bi tenê berberî
dinyayê ye. Her gêrîk jî dikare bixebite û bibe fîl. Ger
gêrîkek hîn bêtir bixebite, li gora xebata xwe dikare bibe fîlek
jî pênc fîl jî. Ger em fîl gêrîk bûn, em çawa bûn fîl? Bibêjin
bibêjin, ger fîl gêrîk bûn, çawa gîhajtin vê rewjê, ew ê çawa
bigihêjin vê rewjê? Ji Siltanên xwe re seray û text çêkirin
û hemû nektar, navilca kulîlk û dendikan berhev lcirin ku gîhajtin
vê rewjê. Ger weha biçe, ger sadiqtiya wan a li hember
Siltên weha dom bike, gêrîk ê bikaribin ne fîl bi tenê, bibin
mexlûqên hîn bilindtir jî...

Gêrîlcan hîn ji nuha de, xwe fîl dihesiband. Her yekî ji
108
wan, xwe fîlek dihesiband û xwe bi heybeta fîlekî dinepbcand
û li welat û bajarên xwe digeriyan. Êdî her gêrîkekî, xwe fîlek
dihesiband û her gêrîkî xwe bi fîlbûnê ditikiland. Tew gêrîkên
zerî xwe êdî tam fîl dihesiband.
Wan digot:
- Pêjiyên fîlan ên heqîqî em in.
Û qet tu tijtekî din nedigot. Simbêlên xwe mîna xortiman
dirêj dikirin, li pijta hudhudan siwar dibûn û çi li welatê gêrîkan
biqewimiya, digîhandin Siltên. Kêfa Siltên jî pir ecêb ji
van xeberan re dihat.
- Nuha, her gêrîk xwe wek fîlekî dihesibîne.
- Çi qas baj e, bila xwe weha bihesibinîn. Min jî ev dixwest.
Bila gêrîkbûna xwe ji bîr bikin, xwe çi dihesibînin, bila
bihesibînin.
- Gêrîkan dest pê kiriye û wek fîlan dimejin.
- Ev hîn bajtir e. Min jî ev dixwest.
- Ji bo ku bikaribin wek fîlan bipeyivin, hewil didin.
- Ev a herî baj e... Alîkariya wan bikin, çi ji destên we tê,
texsîr nekin, bila wî zimanê gêrîkan ê ku nayê fahmkirin ji
bîr bilcin û fêrî fîlî bibin. Hîn hîn bêtir alîkariyê bikin.
Ji welatên gêrîkan, ji bajarên gêrîkan xeberên ji derveyî van
jî dihatin.... Van xeberên ku nuh dihatin, Siltan bi temamî
dixist gumanê. Gêrîkan di fîlbûnê de, lingên xwe zêde radidan.
Ger weha dom bike, jerê wan dê ji xêra wan bêtir be.
- Siltanê me, gêrîkan dest pê kiriye û tam wek fîlan xwarinê
dixwin.

Siltanê Fîlan ket taswaseke mezin:
- Ma rast e? Ev çawa dibe, gêrîk çawa dikarin wek fîlan xwarinê bixwin? Wan ev ji ku derxist?
- Dibêjin ku ma em ne fîl in, çi di ber wan keve, dadibelihîne.
Siltanê Fîlan boriya:
109
- Ev nabe!
Ji ber dengê wî, çiya, dejt û daristan hejiyan.
Gêrîkên ku ev deng çû wan, got:
- Rojekê, em ê jî mîna Siltanê xwe, weha bang bikin û çiya, derya, daristan û dejtan bihejînin. Ma em ne fîl in?
Siltên dengê xwe hîn bilindtir dikir û axavtina xwe didomand:
- A, ez destûra vêya nadim. Gêrîk nilcarin wek fîlan xwarinê bbcwin, ew ê bibehicin, bimirin. Gidî, pêjî li vêya bigrin. Serokê hudhudan, a nuha tavilê bifire û biçe welatê gêrîkan, ji qûlên min ên gêrîk re bibeje ku min xwarina wek a fîlan li wan qedexe kir. Dû re, ger ew jî wek fîlan bixwin, ew ê bi xwarinê bifelijin û bimirin. Wê gavê, li vê dinyayê, bêyî gêrîkên qûlên xwe, hem jî bêyî pêjiyên xwe, ez ê çawa bijîm?
Gêrîk fîl in, rast e, ew fîl in, lê bi jertê ku bi qasî fîlan û wek fîlan nexwin... Gidî, Serokê hudhudan, talûkeya herî mezin li ber devê deriyê me ye. Ji qûlên min ên gêrîk re bibêje ku ger ew wek fîlan bixwin, hemû xwarinên li vê dinyayê dê tavilê biqede. Li dinyayê dê xwarin hilê. Ger gêrîk wek fîlan, bi qasî fîlan xwarinê bixwin, li dinyayê dê bi carekê xelayeke weha çêbibe ku çivîkên li hewa, heywanên li erdê dijûrin, hemû mexlûq dê ji nêza bimirin. Ger gêrîk sê rojan, ne zêde sê rojan wek fîlan, bi qasî fîlan bixwin, li vê dinyayê ji bo

xwarinê pariyekî nên jî namîne. Hemû mexlûq dê ji ber xelayê bimirin û dawiya dinyayê dê bê. Van gotinên min, eynî weha bigihîne qûlên min ên gêrîk. Min xwarina bi awayê fîlan, li wan bi carekê qedeke kir. Ev emirê min nayê guhertin. Kî li emirê min guhdarî neke, ew ê di bin lingên fîlan de bipelçiqe.

Serkumikê Berz tavilê firiya welatên gêrîkan, emirê Siltên ji hemû bajaran re cîhê cîhê bi borîzanê got. Gêrîkan li hember vî emirî, dengên xwe nekirin, lê nikarîbû wê filcira ku ev no

çawa fîlîtî ye jî ji serê xwe biavêta.

- Madem fîl ji me çêbûne, wê gavê, em ê jî wek fîlan xwarinê bbcwin. Divê em wek wan bixwin.

Siltanê Fîlan ji Sekumikê Berz pirsî:

- Wan ji bo vî emirê min, çi got?

Serokê hudhudan bersiv da:

- Wan qet tu tijt negot, bi tenê kir ufe uf. Gava ez di ser bajarên gêrîkan re firiyam û hatim vira, min ufe ufên li jêr ên ku ji bajaran dihat, bihîstin. Bajarên gêrîkan bi ufe ufe dixulxulî.

Siltan keniya:

- Ew nekin ufe uf, dê çi bilcin. Hîn pê nehisiyane ku bê tu xwarina wan tune ye jî. Ew nizanin ku bê îsal, ew ê ne bi qasî fîlan, bi qasî gêrîkan jî nikaribin xwarinê bbcwin. Wan ferq nekiriye ku wan ji xwe re qet tu xwarin hilneanîye. Ev bêhij, bi ser de jî radibin dixwazin wek fîlan xwarinê bixwin. Gava pê bihisin ku embarên wan vit î vala ne, tu îcar li daweta ku dê li welatên gêrîkan li dar bikeve, temaje bikî...

Nuha, bihêle bila bilcin ufe uf.

Pijtî demekê, Silêmanê Dunikil û gêrîkên zerî bi xebereke ecêb, dîsa ji welatên gêrîkan vegeriyan:
- Gêrîk bang dilcin û dibêjin ku ma em ne fîl in, em ê jî mîna fîlan nektar, navika kulîlk û dendikan bixwin.
- Van gêrîkan baj rû stend, her yek ji wan êdî xwe wek fîlelcî rasteqîn dihesibîne. Gava Siltan weha difikirî, nikarîbû xwe bigirta û tîq tîqa wî bû. Ma ew jî di warê fîlîtiya gêrîkan de, zêde pê de neçûbû? Gêrîk jî ji bo bibin fîl, çi qas amade bûn! Tu ji xwe re li vê ecêbê binihêre, ew bi ser fîlîtiyê de can didin û hayê tu kesî jê tune ye! Heçî gêrîk in, wek qutiyên devgirtî ne.
Ji Serkumikê Berz û gêrîkên zerî re got:
- Vî emirê min jî bi lez bigihînin qûlên min ên gêrîk, neiii bîîî nebî, bila devê xwe nedin nektar, navika kulîlk û dendilcan, nebîîî nebî! Min ev xwarin bi temamî li wan qedexe kirin. Ev xwarin, ne xwarinên fîlên ew qas piçûk in. Ger gêrîk van xwarinên ku behsa wan hat Icirin bixwin, ew ê jahrdadayî bibin û bimirin. Bila gêrîkên qûlên min hemû tijtên ku fîl dikin bikin, lê nebîîî nebî, bila wek wan xwarinê nexwin. Ew ê an bifelijin û bimirin, an jahrdadayî bibin... Gidî, van gotinên min jî bi lez bigihînin qûlên min.
Hudhud tevî gêrîkên zerî yên li ser baskên wan bûn, firiyan û xwe gîhand welatên gêrîkan. Fermana Siltên bi borîzanan, careke din gîhand gêrîkên hevwelatî.
Siltên pirsî:
- Çi bû? Qûlên min ên gêrîk çi got?
- Gava wan ev gotin bihîstin, hemuyan bi hevdu re dest bi ken kir. Hemuyan bi hevdu re, bê rawestan, bêyî ku dengê

xwe daxin an bibirin, dest bi bangkirinê kir û got ku em fîl in, em fîl in, em fîl in... Gava em dihatin vira, dengê wan hîn jî li pê me dihat.
Siltên got:
- Bila bikenin. Bila bê rawestan bikenin û bibêjin ku em fîl in. Wan ji bîr kiriye ku wan li vê dinyayê, nektar, navilca kulîlk û dendikên ku têra deh salan dikin, anîne û li embara min kom kirine... Hela, bila bikenin, ew ê di nêzîk de ferq bikin ku...
Pijtî çend rojan, hudhud û gêrîkên zerî bi xebereke weha hatin ku Siltan hingî jaj ma, ew guhên wî yên wek merjan, bi awayê ku careke din bi hêsanî danekevin, bel bûn.
Siltanê Fîlan nilcarîbû di cîhê xwe de rawestiya, wek dînan li dora xwe dizîvirî û xwe hilor dikir û digot:
- Ev nabe! A, ev qet nabe!
0 emir li ser emirî dida Serkumikê Berz û digot:
- Bibêje, bibêje, dîsa bibêje.
112
Serkumikê Berz jî gava digot, kumika wî ya turuncî, baskên wî û lingên wî jî li hevdu digeriyan:
- Ez çûm welatên gêrîkan. Ez çûm ku ez çi bibînim? Li welat û bajaran qet tu kes nemaye. Min ji gêrîkekî nexweş pirsî, min got ku lo hevalo, gêrîk li ku ne. Wî got ku gêrîk tam bûne fîl û çûne daristanê. Ez di cîh de firiyam û çûm daristanan. Ez çûm ku ez çi bibînim, Siltanê min, gêrîkan hemuyan eyn wek fîlan, qûnên xwe belot lcirine û bê rawestan di daran, diriyan, qirjikan û gîhayan de didin û dixurînin.
Ez li hemû daristanan firiyam, ez li vê dinyayê bi rojan,

daristan bi daristan, dirî bi dirî geriyam. Li her deverê, di koka her darê de, di bin her dirîyî, her qirjikî de, komeke gêrîk qûnên xwe dabûn wan û hema tê didan. Li her devera ku ez diçûmê, min dipirsî, ev çi hal e, hevalno? Wan ji min re digot ku em bûne fîl, em tam bûne fîlên wek fîlan. Wan digot ku oooox, fîlbûn çi qas baj, çi qas xwej e û qûnên xwe dixurandin û mest dibûn. Siltanê min, nuha hemû gêrîkên dinyayê, bi hevdu re dev ji hemû lcaran berdaye û tev nexwejan herkes li daristanê ne û qûnên xwe di daran, qirjikan û diriyan de didin û dixurînin. Bê rawestan dibêjin ku fîlbûn çi qas xwej e, çi qas xwej e û qûnên xwe her tê didin. Xwarin, vexwarin, xebat, gera li kêfê, xew û îstirehet, hertijt, dinya ji bîr kirine û bêyî ku saniyeyekê navbirê bidinê, qûnên xwe di daran de didin. Wan biryara xwe daye ku ew ê jî êdî wek fîlan lcar nekin û destên xwe di ava sar û germ de danekin. Dibêjin ku ger em ji îro û pê ve bimirin jî, ger me çênî bi çênî hûr bikin jî, em nikarin qûnên xwe ji daran veqetînin. Oooox, fîlbûn çi qas xwej e, çi qas xwej e! Bila Siltanê me sax be, pijtî ku wî em kirin fîl û em bi fîlîtiya me da hisandin, wê gavê, me jiyan bi çavên serê xwe dît. Na na, bêyî ku em fêr bibin qûna xwe di daran de bidin, em ê ker bihatana vê dinyayê û ker biçûna. Em ê heta mirinê, weha, tam weha "3
fîl bimînin û em ê qûnên xwe weha bê rawestan di daran de bidin û bixurînin.
Serkumikê Berzê ku nilcil, ling, bask û kumika wî li hevdu geriyabûn, hîn çi digot, çi nedigot! Wî got got, dû re betilî, rawestiya û xwe li ber çavên Siltên, li ser guliyê dara gûzê danî.

Siltên got:
- Çi bi qûna te hatiye?
Qûna Serokê hudhudan rût bûbû, perîkek jî pê ve nemabû.
Serkumikê Berz got:
- Gêrîk ji vira û heta mala Xwedê bi heq in. Ez jî bûm fîl,
min ji xwe re darek peyda kir û qûna xwe bê rawestan di darê
de da û xurand. Her ku min xurand, ez mest bûm û her
ku ez mest bûm min xurand. A, bi vî awayî perîkek jî bi qûna
min ve nema û qûna min weha zelût bû. Hemû hudhud
û çivîkên din jî wek min kir û qûnên xwe sipartin daran û
dest bi xurandinê lcir. Nuha, li jora daran çivîk û li biniya
daran jî gêrîk her xwe di daran de didin û mest dibin, xwe
wenda dikin.
Siltanê Fîlan bi qasî bejna fîlelcî hilor bû û boriya:
- Qedexxxeeee!
Gêrîk û hudhudên ku wek wî dikir jî bi hevdu re, bi kêf
bang kir:
- Qedeeeexxxxeeee!
- Dê taliya dinyayê bê. Ger hemû mexlûq ferî vî awayî bibin,
dê taliya mexlûqiyê, xwezayê û kaînatê bê, qedeeexxxxxeeeee!
Hemû mexlûqên li daristanê, teqlîdê wî kir:
- Dê taliya wan bê, taliya wan bê, qedeeexxxxxeeeee!
Siltanê Fîlan ji ber vê rewja dijwar dîn bû, bi zorê hilma
xwe dida û distend .
"4
- Serekhudhudo, hey neteweyê serkumikberz, hela tu, hela
tu, berê tu, bes qûna xwe di daran de bide.
Serokê hudhudan qûna xwe bê rawestan her di wî guliyê

dawiyê de da û weha got:
- Ez nilcarim dev jê berdim, Siltanê min. Ez nikarim dev jê berdim, Siltanê min, ooox, ez nikarim dev jê berdim. Tu dixwazî, a nuha, min têxe bin lingên xwe û bieciqîne, lê ez dîsa jî nikarim dev ji xurandina qûna xwe berdim... Ooox, ooox, ox, jikir ji te re Siltanê min, fîlbûn çi qas xwej e. Dinya heye. Ez ew qas jiyam, ez dizanim bê dinya jî kengî ava bûye, lê pijtî ku ez bûm fîl û min qûna xwe di darê de da û bê rawestan xurand, min tahma jiyanê dît. Ooox Siltanê min, em berê qet ne jiyane. Min bikuje, min bikuje Siltanê min, lê ez rica dikim, vê fîlîtiya min ji min nestîne. Ma dibe?. 0 tu tijtekî din negot.
Siltan rawestiya, serê xwe xist nav lepên xwe, ber bi bexçeyê xwe ve mejiya û ji Serokê hudhudan ê ku li dora serê wî difiriya re got:
- Hela, tu nuha biçe, ji qûna xwe re darekê peyda bike û tê bide, ez ê hebekî li ser rewja fîlîtiyê bifikirim.
Serokê hudhudan got:
- Tu her hebî, Siltanê min.
Firiya , tavilê çû xwe li dara çinarê ya herî nêzîk girt, qûna xwe sipart guliyê wê yê qajilhijk, dest bi têdanê kir û mest bû.
Siltanê Fîlan çû bin darên çinarê yên mezin ku wî ji bo xurandina qûna xwe li bexçeyê xwe çandibûn. Qûna xwe sipart nava dareke mezin a zexm, tê da û dest bi fikirandinê lcir. Pijtî ku demeke dirêj filcirî, bangî Serkumikê Berz kir. Di vê navê de, Serokê hudhudan jî fikirîbû.
Siltanê Fîlan got:

"5
- Hevalo, ez pir fikirîm, lê ez negîhajtim tu encamê. Min ji we û gêrîkan re got ku hûn fîl in û hûn ê bibin fîl, lê min negot ku hûn ê wek fîlan xwarinê bbcwin, biwerimin û dû re bifelijin. Min ji we û gêrîkan re got ku hûn fîl in, ger hûn bixebitin, hûn ê bibin fîl, lê ma min negot ku hûn ê wek fîlan, nektar, navika kulîlk û dendikan bbcwin. Min ji we û gêrîkan re got ku hûn fîl in, lê min ji we re negot ku hûn ê qûna xwe heta û heta bixurînin. We hemuyan di fîlîtiyê de, lingên xwe zêde radan. Kekê min î Serkumikê Berz, di vê pirsê de, di vê pirsa fîlîtiya zêde de, alîkariya min bike. Tu mirovan û hemû mexlûqan, mirî û zindiyan nas dilcî, te bi sedsalan, lingê xwe di gelek feqan de kotiye, qet nebe di vî lcarê xurandinê de alîkariya min bike.
Serokê hudhudan got:
- Ez nikarim. Ez nikarim bikim ku tu mexlûq dev ji vî haweyê xwej berde. Baj e ku mexlûqên din, hîn bi vî haweyê fîlan ê xweeej nehisiyane. Ger pê bihisin, ew ê dinyayê ser û binî hevdu bikin.
Siltanê Fîlan bi tirs û heyecan bang kir:
- Gidî, bila pê nehisin!
Dû re emirê xwe yê qet'î da:
- Min qedexe lcir. Min qûnxurandin bi yekcarî qedexe kir. Fermana min bigihîne hudhudên xwe û gêrîkan, bila nuha, îroj, ji nav dirî û daristanan bi lez derkevin. Ger ew dernekevin, ez ê serê sibehê, birûskê biavêjim hemû daristanan û wan bijewitînim, mahf bikim. Hem hudhud, hem çivîkên din ên xwe dixurînin û hem jî gêrîk dê bi carekê bibin qîjot.

- Ez di bextê de me, weha neke Siltanê min...
- Ma tu li hember min radibî?
- Na, Siltanê min.
- Wê gavê, biçe welatên gêriican û fermana min bigihîne wan. Ger heta sibehê, wan qûnên xwe ji daran veqetandin

veqetandin, na na, êdî ew dizanin bê dê çi biqewime.
Serelchudhud dê çi bike, tevî çend hudhudên xwe firiya çû daristanê, hat ser serê gêrîkan. Gêrîk gulok bi gulok bi ser hev de kom bûbûn û qûnên xwe bê rawestan di binê daran, gewde û guliyên wan de didan. Serekhudhud firiya û berê li vê daristanê, dû re jî li daristanên din geriya. Hemû tijtên ku wî li welatên gêrîkan dît, ev bû.
Li ser daristanê firiya û xwe li ser guliyê herî bilind ê dara ku tam di orta daristanê de bû, danî. Li vê derê, hemû gêrîkan dikarîbû ew bidîta û dengê wî bibihîsta.
Bi borîzana xwe dest pê kir. Dengê wî li çiyayên bilind î dûr olan da:
- Heeeeey gêrîkno, bila deng bê we hemuyan, ev emirê Siltanê me ye. Emirê Siltanê ku Serokê hemû mexlûqan, Serokê jêr û pilingan, gur û wawîkan, kerkedan û kerên bejî, mar û tîmsehan e. Ji bo min jeref e ku ez emirê Siltanê me, wî Siltanê muhtejem, wî Siltanê dinyayan, digihînim we.
Berê jî ez pê serbilind dibûm ku min emirê Silêmanê ku Siltanê hemû mirov û mexlûqan digihand qûlên wî. Heeey gêrîkên mezin î esil-fîl, nuha, guhên xwe bidin min û li min guhdarî bikin. Siltanê me emir da ku hûn ê fîlên mezin teqlîd nekin û qûnên xwe sal duwanzdeh meh di daran de nedin.

Ev bi yekcarî qedexe ye. Me ji we re got ku hûn fîl in,
hûn ê bibin fîl, lê me ne got ku hûn ê wan qûnên xwe yên
piçûçik bê rawestan di daran de bidin. Ger ev weha dewam
bike, ger hûn qûnên xwe ji daran bi dûr nexin, kî, lcî dê bixebite
û ji me re nektar û navika kulîlkan berhev bike? Ger
hûn dev ji vî haweyê xwe yê fîlî bernedin, ez jî, fîl jî û hûn jî
dê birçî bimînin. Ji ber vê yekê, qûna xwe di daran de dayin
û raketin ji bo fîlan e, ne ji bo fîlgêrîkên ku dû re bûne fîl e.
Heeey fîlgêrîkên qûlên min, ez bi qet'î emir didim we ku
hûn ê a nuha, di vê deqîqeyê de, dev ji haweyê xwe yê fîlî
«7
berdin, qûnên xwe ji daran bi dûr bixin û biçin bajarên xwe.
Siltên weha emir da, Şiltên weha emir da, bila deng bê we
hemuyan.
Gêrîk ew qas mest bûbûn ku li hember vê bangkirina Silêmanê
Dunikil, tu kesî reaksiyoneke herî piçûk jî nîjan nedida.
Tew tu kes ne li wî dizîvirî û ne jî lê dinihêrî.
Bire bira Serekhudhudî bû, digot:
- Siltan dibêje ku Siltanê me yê mezin dibêje ku min got,
ew fîl in, lê min negot, ew ê bi qasî ku qûnên xwe di daran
de bidin, bibin fîl. Min negot ku ew ê bi qasî ku nektar, navika
kulîlk û dendikan bixwin, bibin fîl. Ew fîl in, lê bi qasî
bejnaxwe fîl in.
Xulxulekê daristan ji serî heta binî da ber xwe:
-Emfîlin!
- Em fîîîîîl in!
- Em fîîîîîîîl in!
Serkumikê Berz bi borîzana xwe bang Icir:

- Hûn fîl in, lê hûn bi qasî bejna xwe fîl in.
- Bi qasî bejna xwe, bejna xwe, bejna xwe.
- Em fîl in, em wek fîlan fîl in.
- Em wek fîlan fîl in.
-Wekfîlan!
- Hûn fîl in, fîl in, lê... Siltên ji we re emirê xwe yê qet'î jand. Ger hûn heta serê sibehê, qûnên xwe ji van daran bi dûr nexin, Siltan jî dê birûska xwe biavêje ser we, ser daristanê, ser dinyayê û ew ê we bijewitîne, bike qîjot, bike xwelî.
Hûn qet dizanin bê birûsk çi ye, hûn dizanin? Emirê Siltanê me qet'î ye. Hûn ê qûnên xwe ji daran bi dûr bixin!
Daristan dîsa xulxulî û got:
- Em fîîîîîl in!
Serekhudhudî îcar ji gêrîkên zerî re got.
Wan jî weha bersiv da:
118
- Em fîîîîîl in!
Wey, dinya hatiye guhertin, ew gêrîkên zerî yên mislcîn, xayin û pîsik jî li kerê jeytên siwar bûne û dibêjin, em fîl in.
Vê carê berê xwe da hudhudên li ser guliyan. Qûnên hemuyan zelût bûbûn, bê rawestan û bi awayekî ecêb di guliyan de didan.
- Hudhudên min, ez emirê Siltên ji we re dibêjim. Qet nebe, hûn hîn nebûne fîl, hûn jî wek min, hîn çivîk in, ne weha?
Daristana ku ne serî hebû û ne jî binî, bi hevdu re lcir çîve çîv:
- Em fîîîîîl in!

Serkumikê Berz gulî bi gulî firiya û bi hemû gêrîk û hudhudan re peyivî. Nikarîbû tu kes bixapanda. Bi tu kesî neda qebûlkirin ku ew ne fîl e. Ew ê çawa bi wan bide qebûlkirin, ew bi xwe jî Serokê hudhudan Serkumikê Berz jî bawer dikir ku ew fîl e, hem jî fîlelcî renga reng, bi neqij, xwejik, bi jewq û bi hereket. Di firseta herî piçûk de, tavilê qûna xwe disipart guliyekî, dbcurand dixurand û bang dikin

- Ma hûn li emirê Siltên guhdarî nakin?

Deng ne ji gêrîkekî û ne jî ji hudhudekî dihat. Zeriyekî piçûçik jî bersiva wî nedida.

- Serê sibehê birûsk, birûslca Siltên... Tu ruhber dê nemîne. Koka hemû mexlûqan dê biqelihe.

Ji derveyî xirte xirta xurandinê, tu deng ji daristanê nedihat. Serkumikê Berz bêyî ku ji ya xwe dakeve, du rojan, sê rojan li ser hevdu bi gêrîk û çivîkan re peyivî.

Got:

- Birûsk, agir, av... Siltan dê koka hemû mexlûqan... Ew ê we hemuyan... Hûn ê bimirin...

Ji keviran deng dihat, lê ji gêrîk û çivîkan nedihat.

"9

Dû re, dengê xulxuleke qalind mîna ku ji devereke kûr dihat, ji nijka ve darisran dagirt:

- Siltanê me yê ku Siltanê siltanan e, dilcare hertijtên me ji me bistîne, lê nilcare fîlîtiya me ji me bistîne. Tu kes nilcare xurandina me ji destên me bistîne. Em li darê dinyayê, carelcê bûn fîl. Em wê jî ne dikarin bidin Siltên û ne jî jahî. A, em ê heta qiyametê, qûnên xwe weha bixurînin.

Pijtî xulxuleyê, dengê xirte xirra xurandinê daristan dagirt.

Serekhudhud firiya, peyivî, pir li ber wan geriya, ew tirsandin, êdî pijtî wê, ji devê tu kesî peyvek jî dernexist. Tevî hudhudan hat ba Siltên. Siltan bê xew û bê xwarin û vexwarin destê wî li ber guhên wî û li benda wî bû.

Tavilê pirsî:

- Çi bû?

Serelchudhudî got:

- Tu tijt nebû. Qet tu tijt. Min tijtekî weha qet nedîtiye. Belkî, ji gava ku dinya hatiye avakirin û vir de, ez li ser serê dinyayê difirim, min ew qas mirov, ew qas mexlûq dîtine, ez bi ew qas mexlûqan re jiyame, lê min tijtekî weha nedîtiye. Ev fîlbûn jî çi karekî ecêb e ku tu kes nikare qûna xwe ji daran bi dûr bixe. Tu kes, ne gêrîk, ne çivîkên me, ne jî gêrîkên zerî... Ew qas mest bûne çûne ku... Siltanê min, min got; emir, min got; jewat, birûsk, min ji wan re hîn çi got û çi negot, lê guh nadinê. Tu hereket ne ji gerîkekî û ne jî ji çivîkekî çêbû. Min bi rojan, bi wan re minaqeje kir, lê min bi tenê çend gotin ji devê wan girtin. Berê, hemuyan bi hevdu re got ku em fîl in, em fîl in û dengê xwe birîn. Dû re jî tam pijtî sê rojan, got ku Siltan dikare hertijtên me ji me bistîne, lê nikare fîlîtiya me ji me bistîne. Em fîl in û em ê fîl bimînin. Em bi fîlî hatin vê dinyayê û em ê bi fîlî bimirin. Wan got ku em li darê dinyayê, carekê bûne fîl. Dû re, min çi ji wan re got jî min nikarîbû tu bersiv ji wan werbigirta. He-

mû gêrîk û çivîk ker û lal bûbûn. Ew zeriyên zexel ên dbcwernedîtîjî...

Siltên ji nijka ve ji Serkumikê Berz pirsî:

- Tu çawa yî?

Serkumikê Berz got:
- Qet nepirse, li halê min qet nepirse. Gava ez an difirim û an xwe datînim, ger li deverekê, çavên min bi darekê, guliyekî û diriyekî bikeve, hema ez diçim ba wan û dest pê dikim qûna xwe tê de didim... Ez li ber tu tijtî nakevim, Siltanê min, lê ez li ber dikevim ku ew qas sal derbas bûn û ez wek fîlan nejiyame.
Siltên got.
- Wax wax! Wax, wax wax!
Serkumikê Berz got:
- Tu li ber nekeve, Siltanê min, ez ji ber vê rewjê pir serbilind im. Siltanê min, ev fîlîtî, fîlbûn çi tijtekî ecêb, çi tijtelcî xwej e, lê em pê nehisiyabûn...
- Ger ez a nulia, te biavêjim nav birûskê....
- Ez nikarim dev ji fîlîtiya xwe berdim, Siltanê min.
- Ger ez baskên te bijkînim, jê bilcim...
- Ez nikarim dev ji fîlîtiya xwe berdim, Siltanê min.
- Ger ez herdu çavên te bi hevdu re derxînim...
- Ez nikarim dev jê berdim.
- Ger ez hudhudên te hemuyan bijewitînim, li dinyayê çivîkek bi tenê, hudhudek bi tenê jî nemîne...
Serkumikê Berz got:
- Ez dîsa nikarim dev jê berdim, tu kes jî Siltanê min, tu kesê ku ev tahma pir xwej stendibe û pê mest bûbû, nilcare dev jê berde.
Dû re pesinî û dewam kir:
- Wey lawo, fîlbûyin tijtekî çi qas xwej e!
Rawestiya, piçekî jerm kir, dû re jî bi lez got:

- Piçek destûr bide min, Siltanê min.
Tavilê firiya, çû ba dara çinarê. Pijtî ku qûna xwe bi lez di darê de da, paj de vegeriya.
Siltan keniya û got:
- Min fahm lcir.
0 van hemû tijtan Siltan bi xemgînî da fikirandin. Çi lcawikî kiribû, hem jî kawikiya herî mezin... Ji gêrîkan û çivîkan re çi gotibû? Gotibû ku her yek ji we fîlek e, fîl ji gêrîk û çivîkan çêbûne! De îcar were vî kerî di vî bihurî re derbas bike, de were îcar ji nav vê meseleyê derkeve...
- Em ê çi bikin, birayê min î Serkumikê Berz?
- Siltanê min, qet tu çareya vêya tune ye. Qet tu çareya vê... Hudhud û gêrîk dê heta qiyametê fîl bimînin.
- Lê ew ne fîl in...
- Bûn fîl, Siltanê min. Te ew kirin fîl...
- Me ew kirin fîl, aaax, me ew gêrîkên bi qasî piçekî kirin fîl, aaax, me bi xwe ew lcirin fîl. Me bi destê xwe anî serê xwe. Êêê, dê nuha çi bibe?
- Tu tijt nabe.
- Ma heta qiyametê dê weha be?
- Dê weha be, Siltanê min. Di bin daran de, gulok bi gulok gêrîk û li ser daran jî ref bi refçivîk bi qûnên xwe yên zelûtbûyî, dê xwe her bixurînin.
- Wê gavê, em fîl, fîlên biesil dê çi bixwin? Hûn, çivîkên biesil dê çi bixwin? Me gêrîk fêrî fîlîtiyê kirin, lê fîlîtiyeke xerab; me ew kirin fîl û me dara bin xwe bi destê xwe birî. Kî dê ji nuha û pê ve, ji min re serayê çêbike û embarên min bi

nektar, navika kulîlk, dendik û kêzikan ve dagire? Kî? Aaax! Aaax, gêrîkên min ên ku ez wan geh qezenc dilcim û geh wenda dikim, aaax! Serekhudhudo ka bibêje, me çi kir? Em ji wî pîsê Rîhsorî tirsiyan û me çi kir, me çi kir? Wan tijtên piçûçik jî çi qas zû bawer kir ku ew fîl in... Ew jî çi hazir bûn

ku bibin fîl. Ma min çi dizanîbû, min... Ev adeteke kevin bû, min dizanîbû, ger ez wan nekim fîl -ne fîlên wek fîlanger ez gêrîktiya wan bi wan nedim jibîrkirin, min ê nikaribûya heta dawiyê, ew bi darê zorê di bin hikmê xwe de bihijtana. Ez ji mirovan fêrî vêya bûm. Min got qey her îcada wan baj e, lê binihêre, bê min çi anî serê xwe, min çi derd ji xwe re çêkir! Derba min li min vegeriya. Min got ku ez ê gêrîktiya wan bi wan bidim jibîrkirin... Aaax, ji derdê van însanan, aaax!

Serekhuhudî got:

- Mirov fenek in. Ew mirov, ew mirov pir fenek in. Ez bi wan re gelekî jiyam. Ez wan ji nêzîk ve nas dikim.

- Êêê, a va encama wê. Gava gêrîk bûn fîl, bi temamî ji destên min derketin.

Serkumikê Berz got:

- Dernakevin. Ger mirovan ji gêrîkan re gotibe ku hûn fîl in, sê sed salî li borîzanê xistibe û baweriya wan anîbe ku ew ê rojekê bibin fîl, tijtek di vêya de heye.

Siltên pirsî:

- Ne weha?

Silêmanê Dunikil got:

- Tijtek di vêya de heye.

Siltên got:
- Ger weha be, em lê bifikirin.
Silêmanê Dunikil got:
- Dibe. Hela ez biçim xwe li ser wê darê deynim û qûna xwe baj bixurînim. Siltanê min, ger ez qûna xwe nexurînim, ez nema dikarim bifikirim.
Siltên got:
- Ecêb e. Ez jî weha me. De here, bixurîne û were. Na na, were xwe li ser dara min deyne, tu li jorê û ez li jêrê, em ê xwe bixurînim. Hem em xwe bixurînin û hem jî bifikirin,
123
ma dibe?
Serkumikê Berz got:
- Pir baj e.
Li jêrê Siltên qûna dabû nava darê û li jorê jî Silêmanê Dunikil qûna xwe dabû guliyekî darê û xwe her disûtikand. Pijtî demeke dirêj, Siltên ji nijka ve, ji kêfa qêriya û bangî Silêmanê Dunikil kin
- Zû were, zû were.
Silêmanê Dunikil tavilê ji jorê firiya û xwe bera xwarê da.
- Kerem bike, Siltanê min.
Siltên got:
- Temam, çêbû. Taswasa me bê sebeb bû.
- Çawa?
- Ma di embarên bajarên gêrîkan de, xwarinên wan hene? Ma wan hemû xwarinên ku berhev kiribûn, ji min re neanîn? Ma ew di avakirina serayê û çêkirina textî de, demeke dirêj nexibitîn? Ma wexta wan çêbû ku ew bikaribin ji xwe

re xwarinê berhev bilcin?
Silêmanê Dunikil got:
- Çênebû. Di embarên wan de, piçeke xwarina wan jî tuneye.
- Nuha baj e, hîn zikê wan têr e. Ji der û dorê hineke xwarin jî peyda dikin. Gava ku Zivistan bê û berf bibare, gava ku Zivistan bê û li dinyayê tu kêzik, kulîlk, genim û dendik nemîne...
Silêmanê Dunikil got:
- Gava nemîne, ew ê çi bikin?
- Ew ê çi bikin? Ew ê ji nêza bimirin. Gava birçî bimînin jî, ew ê tavilê tê bigihêjin ku ew ne fîl in, ew ê gêrîktî û çivîktiya xwe bi bîr bînin. Pijtî wê jî gava ew mirinê bi çavên serê xwe bibînin, ew ê bên ba min û xwarinê bixwazin... Ez ê jî...
Hudhud pir tirsiya û li ber Siltên geriya:
124
- Ger ez qûna xwe her bixurînim û her fîl bimînim, tu tijtelcî bi min nakî, ne weha?
- Ez qet tu tijtekî bi te nakim, ez ê bi qasî ku tu bbcwazî jî xwarinê bidim te. Tu çi qas dbcwazî, tu dikarî qûna xwe di daran de bidî. Tu fîlek î.
- Çivîkên min?
- Ew jî piçelcî fil in.
Serekhudhudî kêfa xwe pir anî û got:
- Bila be, bila be. Piçek fîlîtî têra wan dike. Siltanê min, le tu ji bo gêrîkên zerî çi dibêjî? Ger em wan ji fîlîtiyê biavêjin û weha bihêlin, ji xwe, ji gêrîktiyê derketine, ew ê weha li ortê bimînin.
- Ew ê jî piçelcî bibin fîl û mîna çivîkên te, qûna xwe ji salê

carekê bixurînin, ma dibe?
Serekhudhudî kêfa xwe anî û got:
-Dibe.
Ji kêfa, ji ser guliyekî diçû ser yekî din .
- Tu hemû salê, ji fîlelcî baj jî û ji min jî bêtir dikarî qûna xwe bê rawestan bixurînî.
- Tu her hebî, Siltanê min. Nuha, gava Zivistan bê û gêrîk birçî bimînin...
Siltên got:
- Ka em bipên. Bila dev ji qûnxurandinê bernedin, ez ê wê gavê qûna wan bibînim...
Zivistan hat, berfê dayê. Gêrîk û çivîk hîn li daristanê, bêyî ku bibetilin û jê aciz bibin, qûnên xwe di daran de didan. Serekhudhud jî her ji çend rojan carekê, ji seraya Siltên difiriya diçû welatên gêrîkan û daristanan, bêyî ku bi wan re bipeyive, ji jorê li daristanan temaje dikir û vedigeriya seraya Siltên. Çi tijtên ku didîtin, ji Siltên re ta bi derziyê vedikir.
0 Siltan bi bêsebirî li benda wê rojê bû.
125
Gêrîk li jêrê û çivîk li jorê, ji nijka ve, bi xwe hisiyan ku hem serma xwarine û hem jî birçî ne. Çivîk tavilê firiyan û çûn hêlînên xwe, xwarinên ku Siltên ji embaran dabûn wan xwarin û li kêfa xwe nihêrîn. Gêrîk jî berê jaj bûn, li daristanê vir de û wê de çûn û dest bi lêgerînê kir û mîna ku nuh hatine dinyayê xweza bîhn lcir. Rapelikîn daran, xwe bi wan seyand, pelên wan bîhn kirin, simbêlên xwe di hevdu de dan û dûr û dirêj peyivîn. Lê nihêrî ku birçî û tazî li ortê mane. Gêrîk li daristanê çend rojan rêz bi rêz bi vir de û wê de çûn

û hatin.
Birçîbûnê ew qasî li serên wan xistibû ku êdî ne fîlbûna wan û ne jî qûna xwe di daran de dayin, dihat bîra wan. Kal û pîr û zarok ji nêza nema dikarîbû bimejiyana.
Gêrîkê dilqecêb xwe avêt ortê û got:
- Yaho hevalno, Ma berî ku em bibin fîl, welatên me, bajarên me tune bûn?
Heta wî weha got, jajbûna gêrîkan dom kir.
Gêrîkan got:
- Hebûn.
- Êêêê, ma berî ku em bibin fîl, li bajarên me, xwarinên me tune bûn?
Wan got:
- Hebûn.
- Wê gavê, ji bo çi ew qas roj in, em li vê darisranê diçûn A _A ^ u ten?
- Bi rastî, em ji bo çi li vê daristana asê diçûn û tên?
- Em ketin daristanekê, rê ne diyar e...
- Em radikevin radikevin, lê roj ne diyar e...
- Wê gavê, de heydê em biçin welatên xwe...
Gêrîk ji daristan, çiya, gir û geliyan mîna lehiyekê herikîn welatan. Bi rojan, bi hefteyan hatin. Xwe gîhand bajarên xwe, welatên xwe. Bi hatinê re jî êrîjî embaran kir, lê nihêrî
126
ku çi bibînin, embar vit î vala ne. Di embarên tu welat û bajaran de piçek xwarin tune bû.
Gêrîkan got:
- Ji bo Xwedê, çi bi xwarinên me hat?

Gêrîkê dilqecêb keniya:
- Hey ehmakno, hey kawikno, hey birayên min î gêrîkên ku piça eqil di serî de tune no, we fahm lcir, bê ev çi qas wext e ku em ji xwe re xwarinê hilnînin? Ma me hemû hêza xwe neda avakirina serayê û heylo ji orra dinyayê rahta almasa jîn dernexist û text çênekir? Hey birayên min î gêrîkên bîrsar î bêaqil, ma me ew xwarinên xwej ên ku me ji çar aliyên dinyayê berhev kiribûn, nekijandin embarên Siltanê xwe? Ma embarên Siltanê me, nuha heta ber dev ne tije xwarin in? Me ji Siltanê xwe re, bi ejq û hewesê li vê dinyayê, ew qas xwarin dan hev ku Siltanê me jî fîlên wî jî çivîkên wî jî û em hemû gêrîkên dinyayê jî bixwin, em nikarin wan xwarinên di embaran de ne, di deh salan de biqedînin.
Gêrîkan simbêlên xwe dirêj dirêj di hevdu de dan û peyivîn:
- Wê gavê, em ê nuha çi bikin?
Bêyî ku bizanibin bê ew ê çi bikin, simbêlên xwe her di hevdu de dan û tî û birçî li bajaran geriyan. Ne Serekhudhud li ortê xuya bû, ne jî ji Siltên xebereke herî piçûk dihat.
Di van bajar û welatên pir mezin de, wek kevirê di binê bîrê de, bi tena serê xwe mabûn. Piraniya lcal û pîran jî ji nêza ketibûn nav nivînan û ji aliyekî diwerimîn diwerimîn û dimirin.
Di dawiyê de, Gêrîkê dilqecêb dîsa xwe avêt ortê û got:
- Hey hevalno, ma em ê li vê derê, dest û lingên me girêdayî, ji nêza yek li dû yekî bimirin û bimînin? Ger ev Zivistan weha biçe, li ser ruyê dinyayê, gerîkekî zindî bi tenê jî namîne.
127
Mezinên gêrîkan pirsî:

- Ma tu tijtekî ku mirov dikare bike, heye, heeey Gêrîkê dilqecêb?
Gêrîkê dilqecêb got:
- Hela em bifikirin. Dibe ku em ji deverekê tijtinan peyda bikin û zikên xwe têr bikin û ji nêza nemirin.
Mezinên gêrîkan got:
- Ma di vê Zivistana pir dijwar de, gava ku dinya ji serî heta binî di bin berfê de mabe, em ê xwarinê li lcî derê peyda bikin?
- Hela em jî biceribînin, dibe ku em devereke berf lê ne baryayî, embareke genim, firneyek, deriyekî vekirî an sîloyekê peyda bikin... Bellcî embareke xwarinê ya ku ji pêjiyên me maye û hatiye jibîrkirin... belkî, belkî, belkî... Ma we jeva ku lê nebûye sibe dîtiye... De heydê birayên gêrîk, em têkevin rê û dest pê bilcin li xwarinê bigerin. Em biçin biçin û pir dûr biçin, qonaxa jej mehan biçin, em binihêrin bê çi dibe. Çi bibe jî bila bibe, dê baj be. De heydê...
Mezinên gêrîkan pijta xwe sipartin dîwêr û fikirîn. Serê xwe bera ber xwe dan, bi tilîkên xwe ve simbêlên xwe tev dan û fikirîn. Sê roj û sê jevan xew neket çavên wan û fikirîn:
- Ji berdêla ku em ê li vê derê, li nav bajaran weha bipên, bigerin û bimirin, em ê vê Zivistana dijwar têkevin rê û li xwarinê bigerin û bimirin, çêtir e.
Mezinên gêrîkan pijtî ku weha got, da pêjiya gêrîkan û ketin rê. Gêrîk li ser berfa spî, bi rêzên dirêj ji rojhilat ber bi rojava, bajûr û bakur ve kijiyan. Gêrîk li ser berfa ku ne serî hebû û ne jî binî, dirêj bûn. Xwe gîhand paj Çiyayê Qaf, dejtên Asyayê, Anatoliya bi bereket, Çukurova, Mezopotamya

û perên Nîlê. Bi emirê Xwedê, li tu deveran xwarin
peyda nekirin. Gelek gêrîk di bin berfê de man, gelek ji wan
128
di ber lehiyê de çûn û gelek ji wan jî bi epîdemiyê mirin.
Gava gêrîk vegeriyan welatên xwe, ji sisiya yekê hevalên wan
miribûn. Yên ku mabûn jî xizan, perîjan û seqet bûn. Ji nêza
hestî û çerm mabûn. Ew qas pir qeherî bûn ku dixwest dinyayê
bi xezeb bijewitine û hilwejîne.
Simbêlên xwe bê rawestan di hevdu de didan, hevdu bêhn
dikir û dipeyivîn:
-Tîîqtîîîq,embûnfîl,fîl!
- Hey bêhijno, ma gêrîkek dikare bibe fîl? Hey gêrîkên
bêhij!
- Me xwe fîl hesiband û me xwe li hember dinyayê û hemû
mexlûqan rezîl kir.
- Me wek fîlan qûnên xwe di daran de dan...
- Me tê da û em bûn qejmer...
- Me zikên xwe wek ên fîlan werimandin, xortimên xwe
dirêj Icirin û em weha mejiyan û mejiyan...
- Me xwe jî pêjiyên fîlan ên esil hesiband.
- Aaax, em gêrîkên qeşmer... Me xwe bi rastî fîl hesiband!
- Wî Siltanê zikmezin henekê xwe bi me dilcir.
- Wî Siltanê guhkulav.
- Wî Siltanê qûnsor ê qûn bimêj.
-Xortim bi herî...
- Çavkespik.
- Bêvilzîro.
- Terîmar.

- Enî bitulh.
- Wî pîsê nexwejikbûnê!
-Çîpxwar...
- Em bûn fîl, fîl!
- Em gêrîk bûn fîl!
- Em wek fîlan werimîn werimîn û ketin vî halî.
- Me jerm nekir û em sal duwanzdeh meh xebitîn da ku
129
em bikaribin bijibin wan fîlên lcirêt.
- Em bûn fîl, fîl û va tijtê ku divê me bidîta, me dît.
Axavtinan carinan bi awayê tinazê, carinan bi awayê lomekirinê
û carinan jî bi hêrs dom dikir. Hîn ji nuha de, gelek
gêrîk bûne rîhsor, dev ji welat û bajarên xwe berdaye, ji ortê
wenda bûne û çûne ba Rîhsoro.
Gava gêrîk ji serma û nêza dimirin, gêrîkên zerî jî di xêr û
xwejiyê de mabûn, zikên wan têr, kincên qalind li wan, embara
Siltên di emirê wan de, ji bextiyariyê, ji ser hijê xwe çûbûn
û li welat û bajaran diçûn û dihatin. 0 tijtên ku li welat
û bajarên gêrîkan dibûn, herroj digîhandin Siltên.
Siltan ji ber tijtên ku dibihîstin, har dibû:
- Wey bavo, hela tew hûn ji xwe re, li van gêrîkan binihêrin!
Hela tew hûn li van miskînan, li van kêmaqilan binihêrin,
gelo ev xwe çi dihesibînin!... Wey liminê, gêrîkan berê,
xwe fîl hesiband, ne xwe, nuha jî xwe piling dihesibînin, wey
kêmaqilno, wey! Ez ê rê we bidim! Ez ê fîlelcî bi tenê bijînim
û hezar bajarên we bi erdê re bikim yek. Wey kêmaqilno,
wey! Hela hûn li vî derdî binihêrin...
Her ku Siltên ji welatên gêrîkan xeberek werdigirt, ji hêrsa

har dibû, li hundurê seraya xwe bi telaj vir de û wê de diçû û dihat. Mîna xencer di canê wî de radibûn, borînî pê diket.
- Çi dibêjin, çi?
- Henekên xwe bi te dikin.
- Çi dibêjin, çi?
- Dibêjin, terîmar, çavkespik, korê bêhij, Siltanê min.
- Hela li teriya min binihêre, heey Serekhudhudo, ma qet dijibe ya mêr?
- Ma qet dijibê, Siltanê min. Ew derewan dikin.
- Li çavên min binihêre.
- Siltanê min, çavên te dijibin çavên xezalan.
- Ne xwe, ew derewan li min dikin, bêbextiyan li min di-
130
kin, ne weha?
- Bêbextiyan dikin.
- Ji bo çi, min çi bi wan nankor û rezîlan lciriye? Ma min her yek ji wan bênamûsan nekir fîlek?
- Te lcir, Siltanê min.
- Wê gavê, çi dbcwazin?
- Birçîbûnê li serên wan xistiye, hijên wan ji serên wan biriye. Tirsa ji nêza mirinê ew har kirine.
- Ma ji nêza gelek gêrîk mirin?
- Belêêê... Ji nêza, gelek gêrîk mirin û hem jî ji epîdemiyê, Silranê min.
- Bila bimirin, birayê min î Serelchudhud. Ma qey gêrîkên li ser ruyê erdê naqedin... Gêrîk ew qas pir in ku ma tu carî bi mirinê diqedin?
- Diqedin, Siltanê min.

- Tu çi dibêjî, birayê min î Serkumikê Berz? Li vê dinyayê hertijt diqede, lê bi tenê gêrîk naqedin. Gêrîk ew qas pir in ku dinya tije gêrîk e. Ma ew qas gêrîk, bi mirinê diqedin? Binihêre, gava yek dimire, hezar gêrîkên din çêdibin.
- Tu rast dibêjî, Siltanê min. Gava gêrîkek dimire, hezar gêrîkên din çêdibin, lê li hember vê mirina bi ser hevdu de, milyonek jî çêbibin, nikarin îdare bikin, ew ê biqedin.
- Ji bo xatirê Xwedê, vêya di min de neke, birayê min î Serkumikê Berz. Ez ê li vê dinyayê, bê gêrîk çawa bijîm? Gava gêrîk tune bin, lcî dê van xwarinên xwej, van nektar û navika kulîlk, dendik û gîhayan ji min re bîne, kî, kî, lcî? Wax gêrîkên min, qûlên min ên egîd û jêhatî waaax!
Siltên weha kir wax wax ku dengê wî ji hemû welatên gêrîkan hat bihîstin.
- Wax, wax û wax... Waaaax qûlên min ên gêrîk, waaaax!
Serkumikê Berz pijtgiriya wî kir:
-Wax!
131
Siltên got:
- Li min binihêre, ez hemû sûcên ku wan li hember min kirine, efil dikim, lê ez rîhsorbûna wan û reva wan î çiyayî qet efil nakim. Li min binihêre, birayê min î Serkumikê Berz...
- Ez dinihêrim, Silranê min.
- Ez ji van rîhsoran ditirsim, ew ê belayekê bîne serê min.
- Gêrîk ew qas piçûçik in ku ger hemû gêrîkên dinyayê bibin rîhsor jî dikarin çi bilcin?
- Ez dizanim, dizanim, birayê min î Serkumikê Berz. Ew

nikarin tu tijtekî bi van fîlên zirecêb bikin, lê mirovan çi gotiye? Ew mirov çi qas ehmeq bin jî, ew qas jî bi aqil in. Çi gotiye?

Serekhudhudî pirsî:

- Çi gotiye?

- Wan gotiye ku ger dijminê te gêrîk be jî piçûk nebîne. Ez dizanim ku gêrîk dê heta qiyametê di bin emirê min de bimîne. Ew nikarin tu tijtî bilcin, lê divê em dîsa jî rê nedin rîhsoran. Çi dibe, çi nabe, divê dîsa jî hayê me ji me hebe.

Ev reben ew qas piçûçik in ku... Rawestiya, fikirî û xortima xwe ji nijlca ve rakir û got:

- Li min binihêre, hey birayê min î Silêmanê Dunikil. Li min baş guhdarî bike, li vê dinyayê, divê tu mexlûq nizanibe ku ez ji gêrîkên rîhsor ditirsim. Ew ê henekên xwe bi min bikin, ew ê ji min re li defê bixin. Gidî ji bo Xwedê, divê tu gêrîk, tu mexlûq nizanibe ku ez bi rîhsoran mijûl dibim.

- Ew ê nizanibin, Siltanê min.

- Ez li vê dinyayê ji tu mexlûqî jî natirsim. Ez ne ji jêran, ne ji leopardan, ne ji marên boa û ne jî ji mirovan ditirsim.

- Ez dizanim, Siltanê min, tu natirsî.

- Ger ez hêrs bibim, li vê dinyayê tu mexlûq nikare li hember min raweste.

- Nikare raweste, Siltanê min.

- Ez ê dîsa jî van rîhsoran ji ortê rakim û dinyayê bikim Mihdîzeman. Di dema siltaniya min de, tu mexlûq dê nebe dijminê tu mexlûqekî din. Tew ev rîhsor jî dijminên min in, ne weha?

- Ew dijminên te ne, Siltanê min.
- Li vê dinyayê dê tu rîhsor nemîne. Ez ê kolca rîhsoran biqelihînim. Ji derveyî min, tu kes dê nikaribe gotinên wekhevî, azadî û aştiyê bîne ser zimanê xwe. Di dema siltaniya min de, tu kes dê wek wan rîhsoran keda tu kesê din nexwe. Yên ev dinya hêsîr kiriye û dijminê azadî, wekhevî, aştî û biratiyê ne, ew rîhsorên nemerd in.Yên ku nahêlin gêrîk fîlîtiyê bikin û ji fîlîtiya gêrîkan, hem jî fîlîtiya gêrîkên ji esilê xwe dibehecin, ew gêrîkên rîhsor in. Ji bo ku gêrîk bûne fîl, ji ber çavnebariya xwe, dîn bûne. Ji ber ku ew rîhsorên nemerd dê tu carî nebin fîl. Ji ber vê yekê, ew hem dijminên jiyanê, hem yên dinyayê û li dinyayê çi tijtên xwej hebin û hem jî yên min in. Ez ê li vê dinyayê jiyanê li wan heram biicim. Ez ê wan hemuyan bikujim, hemuyan. Binihêre, Serekhudhud tu yelcî ku dinya dîtiye û gelek serpêhatî ye, ev gêrîk hemû jî bibin rîhsor, qet ne girîng e, ne weha? Ger ew agir bin, ancax dikarin bi tenê xwe bijewitîne. Milyonek gêrîk bên ba hevdu, dikarin ancax bibin bi qasî lingekî fîlekî min, wê gavê, ez ê ji bo çi ji qûlên xwe yên gêrîkan bitirsim?.. Ez hêrs bûm û tu nema bû ku min koka hemû gêrîkên dinyayê biqelanda. Ez, ez, ez ji gêrîkan natirsim. Ew ê bibin fîl, fîl. Ew ê di bin birêvebirina min a fîlî ya azad û wekhev de, bextiyar bin. Li vê dinyayê, mexlûqên herî bextiyar lcî ne?
- Gêrîk in.
- Li dinyayê, mexlûqên herî azad û ên di wekheviyê de dijîn, kî ne?
-Gêrîkin.

- Li dinyayê, mexlûqên herî ajtîxwaz kî ne?
- Ma dê Icî bin, gêrîk in.
- Ez ji van rîhsoran pir aciz bûm û min dikira hemû qûlên xwe yên gêrîk ji ortê rakirana... Nuha, Nuha, qûlên min di çi halî de ne? Bi lez biçe, bigere û were. Binihêre bê welatên gêrîkan di çi halî de ne û were ji min re bibêje.
- Li ser seran, Siltanê me.
Serekhudhud tevî hudhudên li ba xwe, firiya û rast çû welatên gêrîkan. Çû ku çi bîbîne, perîjanî, xizanî û xelayeke weha hebû ku qet mepirsin. Rewj ew qas xerab bû ku Serkumikê Berzê ku ew qas dinya dîtiye, ji ew qas epîdemî, bela û felaketan filîtiye jî giriya û bi baskên xwe ve hêsirên xwe paqij kirin.
Bi awayekî pir liberketî vegeriya ba Siltên.
Siltên pirsî:
- Ev çi hal e? Çi bi te hatiye, birayê min î Serekhudhud, çavên min, ev çi ye? Ma çi bela bi ser te de hatiye? Min ev rewja te qet neeciband.
Serkumikê Berz naliya û got:
- Mepirse, Siltanê min, em mahf bûn. Gêrîk diqedin. Aaaax, em ê gêrîkên weha, dostên weha, mexlûqên evîndarê wekhevî, azadî û ajtiyê ku ji bo me li dinyayê bigerin û xwarinên herî xwej bidin hevdu, careke din ji ku peyda bikin?
Aaaax, aaaax! Dimirin, ji nêza hemû bi ser hevdu de dimirin.
Siltên dîsa kir borînî:
- Waaax, waaax!
Gêrîkan hemuyan dengê wax waxa Siltên bihîst û ji ber ku fahm kirin, ev wax wax ji bo wan e, kêfa wan pir hat.

- Waaax, wax, waaax! Baj e, ma ev ehmeqên gêrîk nafikirin bên ba min û xwarinê ji min bbcwazin?
- Kî dizane, belkî difikirin, lê fedî dikin. Gêrîk pir hesas in. Belkî difikirin û dibêjin, em ê çawa biçin û xwarinên ku

me ji bo Siltên anîne, bbcwazin.
Siltan keniya û got:
- Birçîbûn tu hesasiyet mesasiyetê bi mexlûqan re nahêle. Birçîbûn ne min, bavê xwe nas nake. Ka, hebekî raweste, ger rewj weha be, nuha artêşa gêrîkan meydana serayê dagirtine.
Serelchudhud bi lez perwaz da, xwe gîhand meydanê, vegeriya û got:
- Tu rast dibêjî, Siltanê min. Li meydanê ji gêrîkan, ger mirov axê biavêjê, li erdê nakeve. Gêrîk li hemû palan û dora serayê, tev de diçin û tên...
- Heydê, em derkevin derve, ez ê bi qûlên xwe yên gêrîk re bipeyivim.
Derketin derve. Deng ji gêrîkên li palan û li meydanê dernediket. Deng ji keviran dihat, ji wan nedihat.
Siltan derket ser rasteka zinarê li serê meydanê bû û dest bi axavtinê lcir. Hemû tijtên ku difikirî, pir ejkere ji wan re gotin. Bi taybetî diyar kir ku ger ew bibin fîl jî ancax dikarin bi qasî gêrîkekî bibin fîl. Di serê her peyvê de, ev rastiya kevin anî zimên. Her dubare kir. Ji gêrîkan, ji vê qelebalixiya ecêb qet tu deng dernediket. Tev nediliviyan jî.
Siltan jî bi hêrs û bi kerb bê rawestan dipeyivî. Peyivî, peyivî, dû re westiya. Belkî jî hemû gêrîk miribûn. Şik û taswasek pê re çêbû, mexel hat.

- Ma hûn mirî ne, hûn mirî ne?
Dengê wî çiya hejandin, lê dîsa tu deng ji gêrîkan çênebû.
Serekhudhud ber bi hundurê guhên wî yên wek merjê ve
firiya û got:
- Guhdarî bike, Siltanê min.
- Çi ye?
- Guhdarî bike, binihêre, dengê gêrîlcan tê.
- Ez xulxuleke dibihîsim. Çi dibêjin?
- Guhdarî bike, Siltanê min, guhdarî bike. Dengê wan hê-
135
dî hêdî bilind dibe.
- Deng tê min, deng tê min...
- Em birçî ne, em birçî ne, em birçî ne... Em genim dbcwazin.
Genimê me tune ye.
- Hûn jî nektar û navika kulîlkan bixwin!
- Em genim dixwazin, genim...
- Serekhudhud, were ba min...
- Kerem bike, ez hatim, Siltanê min.
- Mezinên wan li baskên xwe siwar bike û bîne ba min.
Serkumikê Berz daket jêr, Gêrîkê dilqecêb û mezinên gêrîlcan
ên din li ser baskên xwe kirin û hat ber çavên Siltên.
Siltên got:
- Ez pir li ber rewja we ketim. Madem hûn ji nêza dilcira
bimirina, hûn ji bo çi nehatin ba min?
- Me nexwest, em Siltanê xwe ji bo canekî aciz bikin.
Siltan bi dengekî xemgînî peyivî:
- Hûn pir nazik in. Hûn dizanin ku bin wan çiyayan ji serî
heta binî, tev de embar in û hundurê embaran jî tije xwarin

e... Gava rewj weha be, ma mirov qet ji nêza dimire?
- Em gêrîk in, em dimirin Siltanê me.
- Ez ê xwarinê bidim we.
- Tu sax bî, Siltanê me.
- Ji bo vê jî jertekî min bi tenê heye.
- Kerem bike, Siltanê me, jertê te li ser serê me.
- Ez ê xwarina ku bi qasî têra Zivistanî bike, bidim her gêrîkî.
Li hember wê jî...
- Siltanê me, hema tu bi tenê canê me xelas bikî û tu çi
bbcwazî, em ê bikin.
- Ez li hember wê jî ji her gêrîkekî termê rîhsorekî dixwazim,
ger sax be, hîn bajtir e. Ger Gêrîkê Kulek ê Rîhsor sax
be, yê ku wî sax an mirî ji min re bîne, ez ê li hember wî,
embareke tije nektar û navika kulîlk û dendikan bidimê.
136
- Her gêrîk dê yelcî rîhsor ji ku peyda bike, Siltanê me? Di
nav me de, ew qas rîhsor tune ne ku...
- Hûn dikarin her gêrîkê ku muhtemelen dilcare bibe rîhsor
jî rîhsor bihesibînin û wî mirî an sax ji min re bînin. Bi
vî awayî, em ê koka rîhsoran û ya yên ku îhtîmal heye ku dikarin
wek wan bifikirin biqelihînin.
Gêrîkan got:
- Dibe, Siltanê me. Em ê vê pêjniyara te, ji neteweyê gêrîkan
re bibêjin, bê Ica ew çi dibêjin. Me bibe, Serekhudhud.
Serkumikê Berz tavilê xwe ji jor de bera xwarê da û gêrîkên
li pijta xwe, li meydanê, li nav gêrîkên din danî û vegeriya
ba Siltên. 0 li benda wan man. Li meydana li jêrê xulxuleke
mezin dest pê kir.

Xulxuleyê her dom Icir. Siltên bi sebira xwe nikarîbû û ji ber vê yekê Serkumikê Berz jej caran jand meydanê:
- Hela biçe, li wan binihêre, bê ew gêrîkên lahnedêhatî çi dikin, ev çi xuixuleya wan e?
Serkumikê Berz di herjej caran de jî got:
- Siltanê min, ez ji xulxuleya wan tu tijtekî fahm nalcim û ez Gêrîkê dilqecêb û hevalên wî jî nikarim peyda bikim.
Her çi qas fîl girs bûn û gêrîk jî tirsonek bûn, Siltên dîsa jî noq ji wan vala dikir. Yên ku tahta almasa jîn ji orta dinyayê derxist, seray çêkir, binê van çiyayan bi hunguv, dendik û bi navika kulîlkan ve dagirt, ger bixwazin, ger piçelcî bifikirin, ger mêrxas bin, li vê dinyayê dikarin çi bilcin û çi nekin. Ma yên ku barê sê-çar qat li giraniya xwe hildigirin, ne ev gêrîk in? Ji bo birêvebirina van gêrîkan, aqil û zanistiyeke pir pêwîst e. Birêvebirina gêrîkan û îstîfadekirina ji wan, bi darê zorê nedibû. Divê tu wan ne birçî bihêlî û ne jî pir têr bikî. Divê ew ne pir feqîr û ne jî pir dewlemend bin. Ji bo ku ew nefikirin, divê tu hertijtî bikî. Di tebîeta gêrîkan de, xusûsiyetên serîhildan, guhertin û rîhsorbûyinê hene. Divê tu rêyei37 kê peyda bikî, da ku ew bi jev û bi roj di xeyala fîlbûyinê de bin... Tu dê bi vî awayî gêrîktiya wan, bi wan bidî jibîrkirin... Ji bo vê jî divê tu awayên nuh, metodên nuh peyda bikî.
Gava Siltan hîn li gelek tijtên weha difikirî, Serekhudhudê ku cara dawiyê çûbû ba gêrîkan, bi jûn de vegeriya. Dengê xulxuleya gêrîkên ku tev de diçûn û dihatin jî wê demê bi derbekê re hat birîn.
Siltên bi tirs pirsî:
- Çi bû?

Serkumikê Berz got:
- Ji yên li ser baskên min bipirse.
Gêrîkê dilqecêb got:
- Em nikarin rîhsoran peyda bikin. Gêrîk dîn bûne. Dibêjin ku ger em peyda bikin jî em nikarin wan ji bo pariyekî nên bikujin. Wan bi xwe, di xwe de kir, ji ber vê yekê heqê wan ê tu gazindan tune ye. Em çi bikin, Siltanê me yê mezin, bihêle, bila ew jî ji nêza bimirin...
- Hela hûn zikê xwe têr bikin... Li wê derê, li ser baskên hudhudan, hûn çend kes in?
Gêrîkê dilqecêb bersiv da:
- Em pir in.
Siltên ji Serkumikê Berz re got:
- Van bibe embara nektaran a yekem.
Serkumikê Berz got:
- Li ser seran.
Û tavilê firiya çû embarê.
Mezinên gêrîkan ên ku daketin embara nektaran a yekem, bi çavbirçîtiyekê êrîjî nektaran kir û ew qas xwarin ku zikên xwe lcirin def. Neteweyê gêrîkan wê gavê bihîst ku mezinên wan zikên xwe bi nektaran kirine def, bi qasî ku ji fîlan hêrs bûbûn, ji wan jî hêrs bûn. Gava mezinên gêrîkan ên ku zi-

kên xwe têr Iciribûn vegeriyan, wan wek ku tijtek nebûbe, wek ku tijtek nebihîstibe, hereket lcir. Dû re ji nijka ve, ruh bi wan ve hat û bi kêfgot:
- Biçin ji Siltên re bibêjin ku her yek ji me dê rîhsorekî bîne. Em ê bînin û ji Siltên xwarina xwe bistînin û ji nêza nemirin.

Serkumikê Berz tavilê hat meydanê, mezinên gêrîkan li ser baskên xwe kirin û firiya. Mezinan tijtên ku bûbûn, ji Siltên re gotin. Siltan bi vê reftariya gêrîkan, pir serbilind bû.
Got:
- Gêrîk bi aqil bûne.
0 pijtî vê biryarê, gêrîkan baz da, çûn bajaran tavilê dest bi nêçîra gêrîkên zerî kir. Di nav wan de, çi qas gêrîkên zerî hebûn, hemû yek bi yek girtin, boyaxa sor di rîhên wan de da û kujtin. Termên gêrîkên zerî yên ku rîhên wan bi boyaxa sor hatibû boyaxkirin ji Siltên re birin û xwarin jê stendin. Meydana li pêjiya serayê, bexçeyê Siltên, pal, gelî, zinar hemû bi termên rîhsoran ve hatin dagirtin.
Her ku termekî gêrîkekî dihat, her ku termên gêrîkan mîna çiyayên li pêjiya serayê bûn, bilind dibûn, Siltan ji kêfa direqisî û ji Serkumikê Berz re behsa kêfa xwe dikir.
- Ev rîhsor çi qas jî pir, çi qas jî pir in, ger min rê ne biriba ser vî karê kujtinê, mala me dê jewitîba.
Gêrîkan wê salê, çi qas gêrîkên zerî hebûn, hemû girtin, rîhên wan bi boyaxa sor boyax kirin, dû re, ew kujtin û termên wan ji Siltên re birin û xwarin jê stendin. Di nav rastiyan de, ev jî hebû ku gêrîkekî pênc, jej heta deh gêrîkên zerî bi boyaxa sor boyax dikirin, ew ji Siltên re dibirin û li hember wan jî ji Siltên ew qas xwarin distend.
Rojekê jî komeke gêrîkên xort, kalekî mezinê gêrîkan girt, herdu lingên wî jikenandin, rîha wî bi boyaxa sor boyax kir

û termê wî ji Siltên re bir û got:
- A, ev Gêrîkê Kulek ê Rîhsor e.

Siltên tavilê bangî Serkumikê Berz kir û got:
- Li vî termî binihêre. Ma Gêrîkê Kulek ev e?
Serkumikê Berz pijtî ku demeke dirêj li dora gêrîkê mirî bi hurmet çû û hat, got:
- Ez nizanim, lê mirî tê guhertin, termê vî gêrîkê kal, pir dijibe wî Kulekê Rîhsor. Siltanê min, ev gêrîk jî ew qas pir dijibin hevdu ku mirov nikare yê zerî ji yê rejik veqetîne... yê jîn ji yê belek veqetîne... Qey ev xort derewan nakin, va lingê vî gêrîkê kal kulek e û rîha wî jî sor e.
Siltan pir jad bû û emir da:
- Ji van xortan re sê embarên navika kulîlkan velcin. îlcsîrê jî bidin wan, bila serxwej bibin.
Gêrîkên xort bi derbekê re ketin hersê embaran jî. Pijtî ku baj têr xwarin, di embaran de yên ku ji ber wan mabûn kijandin bajêr. Hekîman ji navika kulîlkan derman çêkirin. Li wclatan û bajaran, çi qas gêrîkên nexwej hebûn, rehet bûn.
Carekê gêrîkên zerî hatin bîra Siltên û ji Serkumikê Berz pirsî:
- Çi bi qûlên min ên zerî hat, çi bi wan hat? Qet xuya nabin, Serekhudhud. Ew ji min ne xiyidî bin?
Wî Serekhudhudê ku xwedî tecrube, serpêhatî û zane jî li hember vê pirsa ku ew qet ne li bendê bû, nizanîbû bê dê çi bikira. Dikarîbû ji Siltcn re çi bigota? Wî nikarîbû bigota ku hey Siltanê min, wan qûlên te yên gêrîk, qûlên te yên zerî yek bi yek girtin, rîhên wan bi boyaxa sor boyaxkirin, dû re jî kujtin, ji te re anîn û li hember wan jî xwarin ji te stendin.
Siltan dê wê gavê ji hêrsa xwe, dîn bûbûya û ew ê bi wê hêrsê fîl biajotina ser welatên gêrîkan. Fîlên hêrsbûyî dê gêrîkekî

ku nehatibe eciqandin û kujtin nehijtiba. Gava gêrîk
tune bûna, fîl jî hudhud jî dê birçî bimana.
140
Siltên serê xwe belasebeb ew qas bi gêrîkên rîhsor diêjand.
Wî ew serseriyên bêkêr belasebeb ji xwe re dikirin derd...
Zeriyên rîhboyaxkirî yên ji destên gêrîkan xelas bûbûn, ji zû
de reviyabûn û çûbûn tevî rîhsoran bûbûn. Wan jî ji wan
bawer lciribû. Hemû bi hevdu re, bi qelebalixiyeke mezin û
bi def û zirneyê çûbûn pêjiya wan û kêf û ziyafeteke mezin ji
wan re çêkiribûn. A, ji ber vê yekê jî rîhsor bi hevdu ketibûn,
çavên hevdu derdixistin. Gêrîkên zerî jî li gora emirê
ku stendibû, dê wan hîn bêtir bera ber hevdu bidin û ew ê jî
çavên hevdu derxîne, hevdu bikujin û biqedin. Siltan belasebeb
ji van rîhsoran ew qas ditirsiya. Ma ne ev tirsa wî bû sebeba
ku ew qas birayên zerî bêne kujtin?
- Siltanê min, hema hema hemû gêrîkên zerî çûn welatên
gêrîkan. Rîbên xwe sor boyax kirin û xwe xistin jiklê gêrîkên
rîhsor. Li wê derê, çi qas rîhsor mabin, ew ê wan jî bigirin û
ji Siltanê me re bînin.
Borînî bi Siltên ket:
- A, ev baj e. Ez û tu îroj em ê heta sibehê, li ser jerefa qedandina
rîhsoran û kujtina wan a ku heta rîhsorek nemîne,
vexwin. Em ê li wê derê, li bin dara wê çinarê hem vexwin û
hem jî qûnên xwe bixurînin. Wan xortên ku termê Gêrîkê
Kulek ê Rîhsor anîbû jî a nuha bîne vira, peyveke min ji wan
re heye.
Serkumikê Berz pênc hudhudên din jî bi tengala xwe xistin,
firiya û wek birûskê gîhajt welatê gêrîkan, xort girtin û

anîn.
Siltên got:
- Werin vira. Min rutbeya fîlîtiyê da we. Ji bo ku hûn bibin
fîlên baj jî ez ê dibistanên fîlî vekim û weke bilcim fîl.
Mixabin ku hûn ê nuha fîlên wek gêrîkan bin... Lê îroj, îjev,
hûn ê bi min re qûnên xwe di wê dara çinarê de bidin û bixurînin
û mezinahiya fîlîtiyê di kûrahiya dilên xwe de his bi-
141
lcin.
Siltan, Serekhudhud, mezinên hudhudan ên din, gêrîkên
xort, yanî qesasên Hesinkerê Kulek bi hevdu re heta sibehê
vexwar û kêf lcir. Qûnên xwe sipartin dara çinarê û heta sibehê
tê de dan û xurandin.
Û xortên ku nuh bûbûn fîl, ji ber ku Gêrîkê Kulek ê rasteqîn
ji Siltên re neanîbû û ji berdêla wî, gêrîkekî kulek ê sexte
anîbû, ji fîlîtiya xwe fedî Icir û sûnd xwar ku ew ê Gêrîkê Kulek
ê Rîhsor ê rasteqîn bi saxî bigirin û ji Siltanê xwe re bînin.
Edî ew bûbûn fîl, hem jî bi qasî ku bi Siltanê dinyayan re
vexwin, bejdarî ziyafeta wî bibin, bûbûn fîl. Ew ê biçûna dibistanê,
tam wek fîlelcî, bi qasî fîlekî bûbûna fîl, ne weha
wek fîlên bi qasî gêrîkan... Yanî ma êdî, Ji Siltên re peydakirin
û anîna rebenekî hesinkerekî kal î kulek jî dê karekî girîng
bihata hesibandin?
Gava wan xatir xwest, Siltên ew pîroz kirin û belgeya fîlbûnê
jî xist destê her yelcî ji wan. Ev belgeya ku Siltên da
wan, heta nuha belgeya "fîlbûnê" ya yekem bû.
142
ŞEŞ

Gêrîkên rîhsor li welatê zinarên asê, bi hevdu dikevin û bêyî
ku tu karî bikin, bi tenê çavên hevdu derdixin û fîlên har,
Siltanê Fîlan, hudhudên fêlbaz û gêrîkên hevwelatiyên
xwe yên ku bûne hêsirên fîlan û xwe fîl dihesibînin,ji bîr dikin.
Bejeke gêrîkên zerî yên sorboyaxkirî ku ji mirinê xelas bûbûn,
reviyabûn çiyayan. A di dilên wan de ew bû ku gêrîkên
rîhsor peyda bikin û tevî wan bibin. Lê wan ê Gêrîkê
Kulek li kî derê bidîta? Siltanê Fîlan ê mezin, tevî ku siltanê
fîlan bû û tevî ku ew qas wext li wan geriyabû jî di dirheqê
jopa rîhsoran de, agahdariyeke herî piçûçik jî wernegirtibû.
Gêrîkên zerî bi rîhên xwe yên ecêb ên sorbayaxkirî û bi çavên
xwe yên ku ji tirsa, dikira ji serên wan baz bida, ne çiya
hijtibûn, ne gir hijtibûn û ne jî zinar hijtibûn, birçî û westiyayî
digeriyan. Perîjan bûn û ji hal de ketibûn. Ew hîn nuh
tê digihîjtin ku bê çi bela bi ser wan de hatiye. Tê gihîjtin,
bê çi xezeb bi ser wan de rijiyaye, Iê êdî çi feyde. Ger nuha
vegeriyana û ji Siltên re bigota ku gêrîkan çi fen li wî kiribû,
ji berdêla rîhsoran, rîhên gêrîkên zerik sor boyax kiribûn û
termên wan dabûn wî û li hember vî karî jî bi embaran xwarin
jê stendibûn û bi vî awayî ew xapandibû, Siltên dê dinya
xera bikira. Wî dê koka hemû gêrîkên dinyayê biqelanda.
Siltên dê kolca wan biqelanda, lê wan ê bi van rîhên xwe yên
sorboyaxkirî bikarîba baweriya kê bianiya ku ew gêrîkên zerî
ne. Wekî din jî wan ê xwe çawa ji destên gêrîkên bi xezeba
kujtinê, li ser rê û hêsaran li wan digerin xelas bikira û bigîhanda
ba Siltên. Hey rîhên wan sor hatibûn boyaxkirin, ya
143
baj ew bû ku ew tevî rîhsoran bibin û heyfa gêrîkên zerî ji

wan hilînin. Tiştê di wan de hatibû kirin, li vê dinyayê tu mexlûqî, di mexlûqekî din de nekiribû. Zilmeke çawa xerab û ecêb li wan hatibû Icirin! Tijtên ku gêrîkên din, di yên zerî de kiribûn, fîlan jî di gêrîkan de nekiribû. Hezar sal derbas bibin jî ew ê wê rojê qet ji bîr nekin. Di çavniqandinekê de tu zeriyekî ku rîha wî sor nehatibe boyaxkirin, nehatibe kujtin û termê wî li hewja seraya Siltên nehatibe avêtin, nemabû. Wan ruhê xwe çawa xelas kiribû? Ew dem bi tu awayî nedihat bîra tu kesî. Tijtek baj dihat bîra wan, ew jî ew bû ku ew di qelîjteka qalikê dareke çinarê de, sê rojan mabûn, dû re bi hevdu re kulmijîbûn ser sêniyeke mêst û pijtî wê jî bêyî ku li dû xwe binihêrin û tu gêrîk wan bibîne, heta vira hatibûn...

Berî berbangê bû. Ji geliyê din ê bi mij, dengê xujîna avekê hêdî hêdî dihat. Gêrîk jiyar bûbûn û bi lingên xwe çavên xwe difirkandin. Ji nijka ve, ji aliyê avê yê din ve dengek hat guhên wan. Bi vî dengî re veciniqîn. Ev dengê bilind, dengê gerîkan bû.

Heta ku deng di wan de hebû, bang dikir.

- Teslîm bibin, teslîm, teslîm! Ger hûn teslîm nebin, ez ê we bijewîtinim. Derkevin meydanê! Simbêlên me ji bêhnê re ew qas xurt in ku dikare bêhna gêrîkê ku qonaxa çil rojî ji me dûr be jî hilîne. Teslîm bibin, zû teslîm bibin û ruhê xwe xelas bikin.

Gêrîkên /£rî yên rîhsor got:

- Heywax! Heywax û heywax! Me digot qey, me ruhê xwe yê jêrîn xelas kir, lê gêrîkan em li vira jî zevt kirin. Ew ê a nuha me bikujin, termên me ji Siltên re bibin û embarek,

heta du-sê embar nektar, navika kulîlk û dendikan jê bistînin
û zikên xwe ew qas têr bikin, ew qas têr bikin... Eywax!
Eywax û eywax! Me jî digot qey, me ruhê xwe yê jêrîn xelas
144
kir.
Weha dipeyivîn û hêdîka bi zinarekî ve hilkijiyan. Ketin
qelîjteka zinêr. Devê qelîjtekê bi jînê xujûlê ve nuxumand.
Pijtî bîstikekê, lê nihêrîn ku li kêleka wan û li hawîrdora
wan wek axê gêrîk hene. Nihêrîn ku çi bibînin, rîhên van
gêrîkan hemuyan jî sor in. Bi kêfa ji mirinê xelasbûnê, ji qelîjtekê
çeng bûn, xwe avêtin himbêza rîhsoran û dest bi girî
kir:
- Ax, ax, aaax birayên me yên rîhsor, ger we bizanîbûya bê
çi hatiye serê me, çi! Tijtên ku hatine serê me, nehatine serê
gêrîkê ku di ava keliyayî de hatiye dakirin.Tijtên ku hatine
serê me, nehatine serê tu benîademî. Tijtên ku hatine serê
me...
Rîhsoran got:
- Rawestin, hela rawestin, hûn kî ne? Dev ji vî giriyî û vê
pitpitê berdin û bê hûn kî ne, hûn çi ne, ji me re bibêjin.
Gêrîkên din got:
- Em rîhsor in. Ger hûn dixwazin, li rîhên me binihêrin.
Yên din pijtî ku rîhên wan baj kontrol kirin, lêvên xwe
qermiçandin:
- Ya rîhsorbûnê, hûn rîhsor in, lê hûn rîhsorin çawa ne,
me ew fahm nekir.
Gêrîkên zerî yên rîhsor li wê derê, di devê deriyê qelîjtekê
de rûnijtin û birçîbûna gêrîkan û ji ber vê yekê bê wan, gêrîkên

rîhsor çawa teslîmî Siltên dikirin, çi qewimîbû, yek bi
yek gotin.
- A, me jî ruhê xwe xelas lcir û xwe bi zorê gîhand çiyayan.
Gêrîkên hemû welatan li çol û beyaran û li dejt û zozanan li
her deverê belav bûne û li rîhsoran digerin. Tevî ku piraniya
rîhsoran rîhên xwe tavilê kur Icirin jî ji mirinê nefilitîn, wan
ew dîsa naskirin, kujtin û avêtin hewja seraya Siltên. Gêrîkan
li ber serayê, ji serên rîhsoran gir çêkirin... Ax, van çavan
i45
çi dîtin û çi nedîtin, aaax çi! Tijtên ku hatin dîtin, bi zimên
nayên gotin destan têra wan nake... Êdî hûn nilcarin li tu
welatekî gêrîkan, rîhsorekî peyda bikin. A, em li vê dinyayê,
rîhsorên herî dawiyê ne. Em dixwazin biçin ba Serokê xwe,
Gêrîkê Kulek î Rîhsor.
Serokê gêrîkên din ê ku li pêjiya jewqeyê wî sitêrkek hebû,
bi guman peyivî û pirsî:
- Ya rîhsorbûnê, hûn rîhsor in, lê hûn rîhsorin ecêb in.
Hûn qet najibin me. Hûn qet najibin gêrîkên din jî. Ez dibêjim
ku hûn nesilekî cuda û xerîb in, lê min tê dernexist.
Hûn kî ne, hûn çi teba ne?
Yên din bi hevdu re bang kir:
- Ma em, em, em? Ma ji bo ku em bijibin gêrîkan tu hal
di me de hijtine?
- Em xistin zîndanê.
- Em ji paşiyê de nepixandin.
- Ew qas nepixandin ku heryek ji me bû bi qasî fîlekî.
- Ew qas nepixandin ku nêviyê me teqiya.
- Wek garisê li ser êgir.

- Fîl û gêrîkan li teqîna me temase kir.
- Em dan cereyanê.
- Têlên sifir bi kîrên me ve girêdan.
- Cîhê mêraniya me jewitandin.
-Bi jopan li mexist.
- Ew der jî dan cereyanê.
- Em heta bi qirikê xistin binê axê û nepixandin. Çavên me ji serên me baz da.
- Le, birayên me yên rîhsor, wan gêrîkan jikencenin weha bi me lcirin ku ew jikence ji yên ku mirovên ehmeq li mirovan dikin jî xerabtir in.
- Van çavan çi dîtin û çi nedîtin, birayên me yên rîhsor. We tu tijt nedît û hûn bi tu tijtî nizanin.
146
- Ma tu halê rîhsoriyê di me de hijtine!
- Çi bi me Icirin û çi nekirin! We em nejibandin rîhsoran, lê baj bû, hîn hal di me de mabû ku we qet nebe, em jibandin gêrîkan.
Tijtên ku hatibûn serê van gêrîkên xerîb û rewja ku tê de bûn, agir bi dilên rîhsoran xist.
- Hemû gêrîk jî bûn fîl. Gêrîkê ku bi qasî serê derzîyekê jî xwe fîl dihesibîne. Gêrîkên ku li nêçîra me digeriyan, a gêrîkên weha bûn.
Rîhsorên ku hertijt fahm kiribûn, bi wan eleqedar bûn, xwarin dan wan, ew di nav nivînên nerm de xistin xew û birînên wan derman kirin.
Gava serê sibehê ji xew jiyar bûn, li ser lcaniya ku bêhna pûngê jê dihat, tajtê xwarin. Bi rastî, van rîhsoran wek birayan,

heta ji birayan bêtir, li gêrîkên zerî dinihêrîn.
Di nav zeriyan de yê herî kal got:
- Me bibin ba Gêrîkê Kulek î Rîhsor, gelek tijt hene ku divê em jê re bibêjin. Gêrîk, van gêrîkên nemerd, van gêrîkên dijminên rîhsoran dê tu carî nikaribin ji bin nîrê koletiya fîlan rizgar bibin, lê dîsa jî divê em ji Hosteyê xwe yê Kulek re tijtinan bibêjin.
Rîbsorê jewqe bisitêrk got:
- Ax, ax birano, mbcabin em ê tu carî, heta qiyametê, nikaribin ji bin destê fîlan rizgar bibin, aaax! Dîsa jî biçin ji Hosteyê me re bibêjin. Mixabin, fîl mezin û gêrîk piçûk in, aaax, mixabin, mixabin!
Di nav zeriyan de yê herî kal got:
- Aaaax, pir mixabin! Fîl bi qasî çiya ne û her gêrîkek jî bi qasî serê derziyê ye, aaaax, pir mixabin... Ger di nav me de, gêrîkek bi tcnê, ne zêde, gêrîkek bi tenê bi qasî fîlekî mezin bûya, ne weha?
Gêrîkê jewqe bisitêrk keserek kûr kijand û got:
147
- Tune ye. Gêrîkek weha tune ye û dê çênebe jî...
- Ger yek hebûya dê hemû fîlên dinyayê...
Yê din got:
- Hiiij!
- Ma bi rastî, hûn li vê derê, li vî çiyayê xewle ji bo çi rawestiyane? Hûn li benda çi ne?
Yê jewqê bistêrk got:
- Ji me re dibêjin, çiyagerok. Em derketine çiyayî. Em li vê derê, li benda fîlan in. Hosteyê Kulek nexwest ku em derkevin

çiyayî. Ji me re got ku karê ku hûn dilcin xeyal e, naçe
serî.
-Ji bo çi?
- Wî got ku bi gera li çiyayî, nêçîra fîlan nayê kirin.
- We çi got?
- Em dibêjin ku em ê bikin.
- Nêçîra fîlan ancax li çiyayan dikare bê kirin.
- Ma çekên we hene?
- Hene, tîrên ji xortima kelmêjan.
- Waaa, baje...
- Em ê li vê derê rawestin û van tîrên ji xortima kelmêjan
biavcjin çavên fîlê ku bê...
- Fîl dê jahrdadayî bibin û bi tayê bikevin û bimirin.
Gêrîkên rîhsor ên çiyagerok hatin galeyanê hemuyan bi
hevdu re, dest bi peyvê kir:
- Ji her çavên fîlekî re, hezar xortimên kelmêjan.
- Her fîlê ku tîra ji xortima kelmêjan lê bikeve, dê bilerize
û hîn li hewa be ew ê bimire û di cîhê xwe de were xwarê...
- Hosteyê Kulek got ku ev nabe.
- Wî ji ku dizanîbû ku nabe?
- Wî got ku tîrên kelmêjan di fîlan re naçin.
- Wî ji ku dizanîbû?
- Tîrên kelmêşan ne bi tenê di fîlan re, heta di zinar, hesin
148
û daran re jî diçin.
Hemû gêrîkên zerî yên rîhboyaxkirî bi hevdu re bang lcir:
- Tê re diçin!
- Tîrên ji xortima kelmêjan ne bi tenê fîlan, heta mirovan

jî dikujin.
Zeriyan bang kir:
- Heta mirovan jî!
- Ev Hosteyê Kulek rîhsorekî baj, bi esil, jîr, bi aqil û bi namûs e, lê nema dilcare serrast bifikire. Li wê derê, li orta çiyayan dest û lingên xwe girêdane, rûnijtiye û her dbcwîne. Bi ser de jî rîhsor jandine welatên gêrîkan û herroj bi bêsebiriyeke mezin li benda xeberên wan e.
- Di nav zeriyên rîhsorboyaxkirî de yê herî kal bi dengekî hêl got:
- Şaj e, ew jaj e û hûn rast in.
Rîhsorê jewqe bistêrk bang kir:
- Em rast in. Rêya me, tîrên me...
Rîhsorên çiyagerok bi kêf bang lcir. Dengê wan di çiyayan de olan da:
- Rêya ku me daye ser raaast...
Serokê zeriyan got:
- Şajiyek we bi tenê heye.
Ruyê gêrîkê jewqe bistêrk ji hêrsa sorîkur bû.
Got:
- Ew çi ye? Ji min re bibêje, heeeey gêrîkê ku gelek jikence dîtine... Hevalê ku juxul bi serî de hatine, bibêje, bê ew jajiya me çi ye, bibêje da ku em wê serrast bikin.
Serokê zeriyan got:
- Hûn pir ciwan in. Na na, hûn pir bi aqil û egîd in. Ger hûn ew qas ne ciwan bûna, hûn ê li vê gotina ku ez ê ji we re bibêjim jî bifikiriyana.
Yê jewqe bistêrk got:

- Em ê lê bifikiriyana.
- Fîl nikarin derkevin ser van zinaran! Ji ber vê yekê, Hosteyê me yê Kulek xwe li van çiyayan girt. Ew ê li vê derê bifikire û ji bo zora fîlan bibe, aqilekî peyda bike...
- Em qet li vêya nefikirîbûn.
- Ger hûn li vê derê, heta qiyametê jî rûnin û bipên, hûn ê fîlekî bi tenê jî nebînin ku bikaribe heta van çiyayan hilkije.
-Le, em çi bikin?
- Ger ez nehatibûma, hûn ê heta qiyametê, li vê derê li benda wan rawestiyana.
- Em ê li benda wan rawestiyana. Ji ber ku Hosteyê me yê Kulek ji me re got ku madem we li min guhdarî nelcir û hûn bûn çiyagerok, qet nebe li van çiyayan bigerin û li benda fîlan bin. Nebîîî, danekevin dejtê! Hosteyê Kulek ji me re got ku çiyagerokî hunereke kevin e, qaîdeyên wê hene û ev qaîde qet'î ne. Ji ber wê sebebê, kî ji çiyagerokan dakeve dejtê, ew ê tavil ê bête kujtin.
- Li çiyayan fîl peyda nabin.
Yê jewqe bistêrk got:
- Em qet li vêya nefikirîn.
Serokê zeriyan got:
- Binihêre hevalo, li min baj guhdarî bike, tu nuha bi lez dakeve dejtê. Serokhudhudo peyda bike, ew li her deverên dejtê digere, çavên wî gêrîkê rîhsor ê ku qonaxa çil rojî jê dûr be jî dibîne, guhên wî dengê lingên wan ji qonaxa çil rojî dûr dibîhise. Tu bangî wî bike, lê tîra xwe neavêje wî. Ji ber ku ew qasid e, tu gunehê qasidan tune ye.

Yê jewqe bistêrk bi kêf û heyecan bang kir:
- Tune ye!
- Ji wî re bibêje ku min li hember fîlan jer îlan kir û ez li vira jî dipêm. Ew ê biçe ji fîlan re bibêje. Fîl jî ji bo pelçiqandina we, dê tavilê bi bazdan bên. Netirsin, çavên fîlan gêrî-
150
kan nabînin. Hûn ê xwe di kortalekê de vejêrin û tîrên xwe biavêjin tam hundurê çavên wan, orta bîbikên wan.
Yê jewqe bistêrk gurmijî. Dengê wî wek dengê fîlelcî derket:
- Orta wan!
- Hûn ê bi vî awayî, fîlên ku bên bikujin, fîlên ku bên...
Em gêrîk jî dê azad bibin.
Yê jewqe bistêrk bang kir:
- Em ê azad bibin! Dibe ku ew fîlên zirecêb qet nemirin jî... Ma ew bi tîrên ew qas piçûçik dimirin? Ev tîr di fîlan re naçin. Hosteyê Kulek got ku çermên fîlan ew qas qalind in ku gule jî tê re derbas nabe. Ew dizane, ew hesinker e. Yê ku hesinkerî fêrî mirovan jî kiriye, Hosteyê Kulek e.
Serokên zeriyan got:
- Ger fîl nemirana, dinya dê tije fîl bûya.
Yê jewqe bistêrk bi awayekî dudilî got:
- Dimirin, lê dîsa jî ger em li vira bipên, dê bajtir be. Dibe ku ew bên vira jî. Dibe ku Serekhudhud jî carekê rêya xwe bi vira bixe.
Hemû zerî bi her awayî bi benda rîhsoran ketin, li dora wan çûn û hatin û di dawiyê de, ew ji bo kujtina hemû fîlan îqna kirin.
Rîhsoran berê xwe bi kêf da jêrê û daketin dejtê û zerî jî bi

rehberiya rîhsorekî rênas ji bo biçin cîhê ku Hesinkerê Kulek xwe lê vedijêre, berê xwe bi kêf da jorê û ber bi çiyayan ve ketin rê.

Bi berbanga sibehê re, gava tarî hîn nuh belav dibû û roja ku xêr û xwejî jê dibariya hilat- bila hemû rojên ku xêr û xwejî jê dibarin li me hilên- gêrîkên zerî xwe gîhand cîhê ku Hesinkerê Kulek î Rîhsor ji xwe re kiribû bingeh; wê rasteka di navbera çiyayên asê de ku mirov nikare xwe bigihînê. Ji Hesinkerê Kulek re tavilê xeber hat jandin. Hesinkerê Kulek

151

ji devê jikefta xwe li yên hatibûn temaje lcir, lcir, lê wî ew nejibandin tu tijtekî.

Got:

- Ev rîhsor neketin serê min. Min di emirê xwe de, rîhsorên weha nedîtine. Ev ne elametên xêrê ne. Van tavilê biqewirînin, dbcwazin biçin Icî derê, bila biçin wê derê...

Gêrîkê ku xeber jê re anîbû, ew îqaz kir:

- Gidî ha gidî, Hosteyê me, tu jajiyekê neke, gidî ha! Şikenceyên ku van dîtine, ji yên ku mirov li mirovan dilcin xerabtir in.

- Ma ji yên ku mirov li mirovan dilcin xerabtir in?

Hemû hisên di hundurê Gêrîkê Kulek de hebûn, serî hildan. Rehên situyê wî bûn wek tiliyan û bang kir:

- Nabe! Nabe, Tijtên ku mirov di hevdu de dikin qet tu heywanek nikare di heywanekî din de, tu mexlûq nikare di mexlûqekî din de bike. Ez bawer nakim û ez van jî naxwazim. Ev derewîn in.

Gêrîkên din israr lcir û ji wî re got ku ev rîhsor di nav daristanan

re û di ser çiyayan re derbas bûne û pijtî gelek caran bi mirinê re rû be rû bûne, hatine vê derê. Bi vî awayî kir ku dilê Hesinkerê Kulek î kal li wan bê rehmê û wî jî ew qebûlî huzûra xwe kir.

- Hûn bi xêr hatin.

Serokê gêrîkên zerî got:

- Xêra Xwedê li te be.

Hesinkerê KuJek gêrîkekî ku peyva wî li rû bû. Raste rast pirsî:

- Hûn çi jikil gêrîkên rîhsor in? Rîhên we wek ku hatibin boyaxkirin xuya dibin.

Gêrîkên zerî ji serî heta binî veciniqîn.

- Kê, ji bo çi rîhên we sor boyax kirin? Ger we ew boyax kiribin, wê gavê, we ji bo çi boyax kirin?

152

Dengê Hesinkero wek çakûçê ku bi ser horsî de bikeve bû, gêrîkên zerî ketin tev. Heta demekê jî jaj man, li çavên hevdu nihêrî û nizanîbû bê wan ê çi bersiv bida wî.

Bû inte inta Serokê zeriyan:

- Me pir kijand. Ev çend meh in ku em di rê de ne. Em di bin baran, berf û zîpikê de, bi rojan mejiyan. Baran bariya, em jil bûn. Roj derket em zuha bûn. A, bi vî awayî rengê rîhên me jê çû.

Gêrîkên zerî yên din jî pijtgiriya wî lcir û got:

- Hosteyê me, baran bariya û ji ber wê, weha bû. Na na, berê rîhên me jî mîna yên we, li ber tavê sorîkur dibiriqand. Hîn jî peyivîn, dûr û dirêj behsa tijtên ku hatibûn serê xwe lcirin. Giriyan, gilî û gazindên xwe lcirin. Wan behsa

dinyaya fîl û gêrîkan lcir. Çavên rîhsorên ku li wan guhdarî dikir tije bûbûn û dilên wan bi agirê heyfhilanînê dijewitîn. Serokê zeriyan got:
- Xwezî, em bi ser hevdu de bimirana û me ev rojên xerab nedîtana. Pijtî ku me ew qas êj kijandin û em ew qas caran bi mirinê re rû be rû bûn, ma em dijîn, çi feydeya wê heye.
Gêrîkekî zerî yê ku pir zeîf bûbû bi gazindî got:
- Me êja mirinê dît û derbas kir.
Zeriyên din bi hevdu re giriyan û got:
- Pijtî ku jikenceya fîlan û zilm hebe...
Dilê Gêrîkê Kulek î Hosteyê hesinker bi tu awayî li van ên hatibûn, rûnedinijt ku ew ji bo karelcî bi xêr û rast hatine vira. Di hundurê wî de, pêleke dudiliyê radibû û dadiket û di xwe de dikeliya. Wî gêrîkên zerî kirin rêzeke dirêj û ew li meydanê bi cîh kirin. Rîha wan yek bi yek kontrol kir. Dû re jî destên xwe dan bin çenga xwe û dest bi fikirandinê kir. I^îhsorên din ên ku hatina gêrîkên nuh dibihîst, ji cîhên xwe yên vejartinê, ji daristanan, çiyayan û zinaran bi grûpên qelebalix dihatin û meydan dadigirtin. Gêrîkên zerî jî tijtên
i53
ku hatibûn serê xwe, bê rawestan digotin û dilên rîhsoran dijewitandin:
- Tijtê ku fîlan di me de Iciriye, mirov di mirovî de nake.
Çavên herî dilkevir ên gêrîkên ku li meydanê dixulxulîn û tevde diçûn û dihatin jî bi hêsir bûn.
Di dawiyê de, Hosteyê Hesinker Gêrîkê Kulek î Rîhsor derket ser serê darikekî û bang kin
- Hevalno, divê ez ji we re bibêjim ku baweriya min qet bi

van gêrîkên ku nuh hatine nehat. Di bin van ên ku nuh hatine de, tijtek heye. Bi van ên ku nuh hatine re hey derd û belayek heye, lê min tê dernexist. Min li rîhên van ên nuh hatine nihêrî; rîhên wan hene, najibin rîhên me, min baj lê nihêrî, ruyên wan zipîzer in, mîzaca wan heye, najibe ya me. Gava wî weha got, gêrîk li dijî wî derketin. Hertijt weha tev li hevdu bû ku ji toz û dûmanê, heta demeke dirêj jî ferman nehat xwendin.

- Ew birayên me ne.
- Rengê rîhên wan ji ber ba û berfê jê çûye.
- Fîlan tahde li wan Iciriye.
- Ma di bin ew qas zilma fîlan de, tu halê gêrîktiyê di gêrîlcan de dimîne?
- Li me bifikire, ma di wan rojên ku em hatibûn vira de, em ji van ne xerabtir bûn?
- Hosteyo, bila bê bîra te, tu xwe bîne bîra xwe...

Ma gava te xwe ji ser baskê Silêmanê Dunikil çeng Icir, tu heft roj û heft jevan bi ser hijê xwe ve nehat û me te wek miriya li pijta xwe nekir û heta vê derê hilnegirt?

- Hey Hosteyo, ji xêra Xwedê, gava ku te xwe ji ser baskê Silêmanê Dunikil avêt, te xwe bidîta... Ne rîhsor, lê ji bo ku mirov ji te re bigota gêrîk, hezar jahid lazim bûn.

Gêrîkên li meydanê, her gêrîkekî nuh î westiyayî li pijta xwe kiribû, li meydanê digeriyan û bang dikir.

154

Di herî dawiyê de, Gêrîkê Kulek xwe negirt, dengê xwe bilind kir û bang kir. Êdî nikarîbû dengê xwe bibira tu lcesî, ji ber bangkirinê dengê wî ketibû.

Ew her li ber wan digeriya û digot:
- Li min guhdarî bikin, li min guhdarî bikin!
Hingî bang dikir, ketibû halekî xerab. Êdî tu kesî li wî guhdarî nedikir. Di vê rewjê de, nikarîbû ji ser darilcî daketa, divê çi bikira bikira, rêyek peyda bikira û ji gêrîkan re çend gorin bikirana.
Di dawiyê de, ezmên ruyê xwe tirj kir, dinya tarî bû, birûskan veda û baranê wek xezebê dest pê kir. Zeriyên li pijta gêrîkan di bin vê barana ku wek lehiyê dihat de, ji serî heta binî ji) û pil bûbûn. Boyaxa rîhên gêrîkên zerî jê çû û ji ser pijta gêrîkan ber bi jêrê ve herilcî. Kortikên avê yên li meydanê sorîkur bûn.
Hosteyê Hesinker bi kêfa serkevtinê bang kir:
- Lê binihêrin, lê binihêrin! Hey birayên min ên rîhsor lê binihêrin! Li boyaxa rîhên van binihêrin. Gava baran bariya, hiliya. Ma min ji we re negotibû ku di van de ecêbiyek heye, ev rîhsorên sexte ne? Li kortikên avê binihêrin, ji ber boyaxa rîhên wan, sorîkur in. Ev zerî ne, zerî. Fîlan ev ji bo casûsiyê jandine nav me. Van biavêjin derve û bikujin!
Gêrîkan berê ii erdê nihêrîn û dû re jî gêrîkên li pijta xwe danîn û li rîhên wan yek bi yek nihêrîn. Boyaxa rîhên wan jê çûbû û di jûna wan de, mûyên zipîzer mabûn.
- Ev çi halê we ye? Ev çi ye? Ka, hûn rîhsor bûn?
Gêrîkên zerî bi tirsa mirinê lerizîn û got:
- Li me binihêrin, bê em çawa dilerizin. Em ji tirsa, ji nêza Û ji betilbûnê weha zer bûn. Ma gava hûn ditirsin, hûn ji me jî bêtir zer nabin?
Yên din bi hevdu re got:

- Em jî zer dibin, em jî zer dibin.
i55
Dû re hêrs bûn û lê zêde kir:
- Ev birayên me ne. Hey Serekhesinker, ew nikarin ji derveyî vira, biçin tu devereke din!
Yê Hesinker fikirî:
- Mala min şewitî. Siltanê Fîlan peyayên xwe jî jandin nav me.
Lê di dilê wî de gumanek mabû. Ma ger Siltanê Fîlan peyayên xwe bijandana nav wan, dê ew weha bijandana? Qet nebe, wî dê rîhên van zeriyan yek bi yek baj boyax bikirana û ji ser baskên hudhudan daxistana erdê. Ew ê jî bihatana û rêketana nav rîhsoran. Qet tu kes jî pê nedihisiya. Fenek di vêya de hebû, lê çi bû? Serekhesinkero tevî ew qas aqil, tecrube û jiyanê jî nikarîbû bersiva vê pirsê peyda bikira.
Li meydanê, êdî ji her seriyekî dengek derdiket.
- Tu, tu, tu Hesinkero, ma gava te xwe ji ser baskê Silêmanê Dunikil avêt û tu reviya, rîha te weha zer nebûbû?
- Te, te wê gavê li mirêkekê binihêriya, le wê gavê...
- A, wê çaxê te dê halê xwe bidîta.
- Tu wek pelê çilo dilerizî.
- Ne rîh bi tenê, porê te jî zipîzer bûbû.
- Zerê lîmonî.
- Em hemû bûbûn rîhzer, ne rîhsor.
- Em wek lehiyeke zer herikîn û hatin vira.
- Heey Serekhesinker, Hosteyê mezin, ma çend meh, çend meh derbas bûn ku ancax em ji zerîtiyê xelas bûn? Em xelas bûn, lê...

- Em bi ser xwe ve hatin.
Serekhesinker li wê derê, li ser serê darikî tev ne diliviya û
weha mabû, çavên wî ji hêrsa dilcira ji serê wî baz bida... Wî
dizanîbû ku evên ku hatine, peyayên Siltanê Fîlan û yên SerekJuidhudo
ne, lê wî dê ji van rîhsorên ehmeq re çawa bigota?
Baj fikirî, hin gotin û rêyên ji bo îqnakirin û bawerîpê-
156
anînê peyda kirin, lê yên din tew li wî guhdarî jî nekir.
Wî got:
- Wê gavê, ez dixim dengdanê. Ma ev ê li vira bimînin, an
biçin?
Hemuyan bi hevdu re bang kin
-Têxê!
- Ez dixim dengdanê, ev gêrîkên zerî ne, an rîhsor in?
Hemuyan bi awayekî bi xwe bawer bang kir
*T"*A A ,_A A ,_A A _^A A - lexe, texe, texe, texe...
- Ma ev, gêrîkên zerî ne?
- Na, na, naaaa!
- Ma ev rîhsor in?
- Belê, belê, belêêê!
Gêrîkan ji kêfa, lingên xwe yên pêjiyê bi hevdu re rakirin,
rabûn ser lingên xwe yên dawiyê, meydan bû daristaneke ji
lingan pêkhatî.
- Baj e, ez ê çi bibêjim, berpirsiyarî ya we ye, we qebûl kir.
- Me birayên xwe qebûl kirin. Ma me dê ew qebûl nelcirina
û bi jûn de biavêtana bin lingên fîlan?
- Ji ruyê van zeriyan dê gelek bela bên serê me.
- Hey Serekhesinkero, ji wê derê dakeve û êdî dev ji piçûkdîtina

birayên me berde.
- Ma nuha, em hemû bi hevdu re li vê rîha te ya spî binihêrin... em ji te re bibêjin spîyo û ji ber vê yekê jî te bikujin, dibe? Dakeve jêrê!
Hosteyê Hesinker dê çi bilcira, çi ji destên wî dihat, çare tune bû, ji ser darikî daket xwarê. Bi tena serê xwe çû jikefta xwe.Tu kes li jikeftê tune bû. Tu kes li pê wî jî nehatibû.
Li meydanê agir hatibû dadan û kêf û ziyafetê dest pê kiribû jî. Meydan ji ber ava ku ji rîhên zeriyan diherikî, sorîkur xuya dikir. Dar, darik, gêrîk, zinar, kevir, gîha, ax hemû bi rengê sor hatibûn boyaxkirin. Ziyafetê heta serê sibehê dei57 wam kir. Mêvanan heta ku dilcarîbû xwar, vexwar, pir têr bûn.
Li ber destê sibehê bû. Serokê zeriyan hemû zerî li paj zinarelcî civandin
- Hevalno, nuha karê me dest pê dike. Divê em heyfa zeriyan ji van gêrîkan hilînin. Li hember her zeriyê ku hatiye kujtin û li ber deriyê Siltanê Fîlan hatiye avêtin, divê hezar, deh hezar, sed hezar, sed milyon gêrîk bên kujtin. Divê nesilê gêrîkan ji vê dinyayê biqelihe. 0 dê biqelihe! Heyfeke weha di dilê min de heye ku tu nemaye qefêsa sînga min ji ber êjê biteqe. Li vê derê, tu gerîkekî zerî heye ku mirovekî wî ji aliyê wan gêrîkên kole û nemerd nehatibe kujtin? Ger em jî nereviyana û xelas nebûna, gêrîkên kole dê nesilê zeriyan ji ortê rakira. Hevalno, em bi rê ve de peyivîbûn, her gêrîkê zerî dizane bê ew ê çi bike. Nuha, beriya ku ev Gêrîkê Kulek î Rîhsor î nemerd û rezîl, van rîhsorên kawik bbcapîne, divê em ji ortê wenda bibin. Divê du gêrîkên zerî neyên ba hevdu.

Em ê di nav vê qelebalixiya gêrîkan a mezin de wenda bibin. Pijtî çend rojan jî gêrîkên rîhsor dê me ji bîr bikin. Pijtî kû em baj tevî rîhsoran bûn û di nav wan de wenda bûn, êdî hûn dizanin bê hûn ê çi bikin. tijtên me anî serê gêrîkên çiyagerok, em ê bînin serê van jî. Hûn ê her gêrîkî li Hesinkerê Kulek sor bikin da ku rîhsor hemû bi hevdu bikevin, çavên hevdu derxîne û heta ku rîhsorekî bi tenê jî nemîne, hevdu bikujin. Hem rêyên beraberhevdudana rîhsoran û hem jî ya gêrîkên din pir kevin in û hûn hemû bi sedan awayên wê dizanin.

Hemû gêrîkên zerî bi hevdu re bang kir:

- Em dizanin!

- Ji bîr nekin ku gelek rîhsor xwe navenda dinyayê dihesibînin. Hûn ê nêçîra xwe, li gora wê hilbijêrin. Yên ku xwe rizgarvanên dinyayê yên herî mezin dibînin...

158

- Em dizanin!

- Bi bejeke rîhsoran re hêvî û daxwaza ku bibin fîl heye... Li gorawê...

- Em dizanin, li gora wê...

- bejeke wan jî li dû navûdengiyê digerin. Hûn ê bi wan re jî bi wî awayî hereket bilcin.

- Em dizanin, em ê bi wan re jî bi awayî...

- Tew hûn rîhsorên ciwan hîn bajtir nas dikin. Dibêjin, em li vir û xelîfe li Bexdê...

- Em wan jî pir baj nas dikin.

- Hûn dikarin wan pir zû ji rê derxînin û bikin dijminên hevdu.

- Hûn ê wan bikin dijminên pirtûk û xwendinê. Ger bbcwînin jî bila pirtûkên fîlan bixwînin.
- Tu kes nikare zora fîlan bibe. Fîl dê heta qiyametê, heta ku dinya bi rojê bizeliqe, li ser serê me bimînin. Hûn ê bikin ku herkes, hemû rîhsor ji vêya bawer bilcin.
- Em wê jî dizanin.
- Ez dizanim ku hûn hertijtî dizanin, we xwe baj gîhandiye. Lê bi tenê tijtek heye ku divê hûn wê qet ji bîr nelcin. Ew jî çi ye?
Hemû gêrîkên zerî bi hevdu re dubare kir:
- Ew jî çi ye?
- Ew jî gêrîkên rîhsor ên dest bi tûyik in. Nebîîî, hûn nebêjin, em ê wan bixapînin. Xwe nêzîkî wan jî nekin... Li dû xapandina wan negerin, ew cîhê ne. Ji gava ku dinya bûye dinya, wan gelek xapandin, derew û hîle dîtine. Yê ku dikujin jî diafirîne jî ew in. Ew tirsonek, mêrxas, cahil, zal û zarok in. Xapandin û jirêderxistina wan ji rîhsorên bi berçavik ên ku ji parsuyên wan hatine xuliqandin re bihêlin.
Zeriyên di nav kêfê de mabûn bang lcir:
- Em wan jî pir ji nêzîk ve nas dikin.
159
- Mirov ji wan ên ku destên wan bi tûyik in, ditirse. Di dawiyê de, ger ew bixwazin, dikarin zora fîlan jî bibin. Ew ji qûma li deryayê jî û ji stêrkên li ezmên jî bêtir in.
- Em dizanin.
- Her ku we firset dît, hûn ê bikin ku çavên wan kor, guhên wan ker, bêvila wan tu bêhnê nestîne, çermê wan bê his bimîne... Hûn ê hemû rîhsoran jî di vê rêyê de sor bikin. Ji

bo me zeriyan û bapîrên me, jahên me fîlan, dijminên herî
mezin talûkeya herî mezin, ev rîhsorên dest bi tûyik in.
- Em ê xweliyê biavêjin çavên rîhsorên dest bi tûyik.
Gêrîkê kal got:
- Baş e, baj e. Bizanibin ku di hundurê gelek rîhsoran de
daxwazeke xurt a ku dixwazin bibe fîl heye. Min berê jî got
ku ew vêya nadin xuyakirin. A, ev rîhsor dijminên dest bi
tûyikan ên herî mezin in. Ew ji fîlan jî û ji me jî bêtir dijminên
dest bi tûyikan in. Çi qas dost jî xuya bibin, hûn ê bi jev
û bi roj, bê rawestan wan li dest bi tûyikan sor bikin.
- Em ê li wan sor bikin.
- Peyva kurt, hûn ê rîhsoran bikin hezar perçe. Her perçe
dê bbcwaze xwîna yê din vexwe.
Gêrîkên zerî bang kir:
- Ew ê bixwaze vexwin!
- Bejeke rîhsoran a mezin ji jiyanê tecrubeyeke baj wernegirtine,
xejîm in. Ew li hember jiyanê ne nefispiçûk in, dibêjin
ku em li vir û xelîfe li Bexdê.
- Em dizanin.
- Li gor wê, ha! Hûn di derheqê rîhsoran de, gelek tijtan
dizanin. Wê gavê, hûn ê nuha belav bibin û xwe wenda bi-
Icin. Hûn ê di dilê her rîhsorekî de, li hember rîhsorekî din,
agirê heyfhilanîn, tirs û dijminatiyê yê ku tu carî nilcare bête
vemirandin, pêxin. Hûn ê tirsê jî ji bîr nekin. Rêya herî mezin
û kevin ku dikare gêrîkan bera ber hevdu bide, tirs e.
160
Hûn ê wan li hember hevdu bidin tirsandin. Hûn ê tirsê têxin
dilên wan û mezin bilcin. Tirs dê di dilên wan de, di mejiyên

wan de bilind bibe. Tirsa fîlan, a lehiyan, hûn a çi peyda bikin, çi awayê tirsê rêkeve destên we, hûn ê wek baranê bi ser serê wan de bibarînin. Tirs gêriican kût dike, nahêle tev bilive, ji mirinê jî xerabtir dike. Ger hûn bbcwazin, hûn dikarin tirsa Xwedê û tirsa wan a ji hevdu, her û her mezin bilcin.

- Em ê tirsê mezin bilcin. Em ê li ser serê rîhsoran ji hemû tirsan, bi hezaran Xwedêyan biafirînin.

- Hûn ê agirê ferdîtiyê bi tirsê re gûr bikin. Ew hemû dê bibêjin ku em bira ne, heval in, lê hûn ê guh nedinê. Di hundurê piraniya wan de, agirekî ferdîtiyê yê pir mezin heye. Dijminatiya gêrîkan a li hember hevdu ji vê ferdîtiyê çêdibe. Mirin, cavtirsandin, ji hezkirinê bi dûrketin ji vê ferdîtiyê çêdibin. Hûn ê firset û destûrê nedin ku tu rîhsor ji hevdu hez bikin. Ger ev dest bi ji hevdu hezkirinê bikin, çû. Ji ber ku devera hezkirin lê hebe, ferdîtî, tirs, piçûkdîtin nikarin bihewin. Nebîîî, hûn destûrê nedin hezkirinê. Ger ew fêrî ji hevdu hezkirinê bibin, ew ê ji bo têkbirina me jî û ya fîlan jî kengî be, rêyekê peyda bikin. Nebîîî, hûn ê nehêlin ku ev ji hevdu hez bikin. Hûn ê wan ên dest bi tûyik tu carî ji bîr nekin, ji ber ku hertim dilcare lehiyeke hezkirinê mîna ronahiyekê ji wan derkeve û li rîhsoran belav bibe. A, wê gavê, malik li me xera dibe. Her dest bi tûyikek kaniyeke hezkirinê ye. We fahm kir? Hûn ê nehezkirin û dijminatiyê belav bikin.

- Temam, em ê nehezkirin û dijminatiyê belav bikin.

- Heqê xwe helal bikin, jîn heye, mirin heye. Ez ê jî biçim Hesinkerê Kulek ji rê bibim. Ez ê agirê çavtirsandin, guman,

tirs, bêbawerî û nehezkirinê têxim dilê wî.
Gêrîkên zerî got:
161
- Rêya te vekirî be.
Gêrîkê zerî yê lcal emir da wan û got:
- Deqîqeyekê li vira li benda min rawestin!
Pijta xwe da wan û pijtî ku bîstikekê li paj zinarê li kêlekê
bû ma, bi jûn de vegeriya.
Got:
- Li rîha min binihêrin. We li ba tu rîhsoran, rîheke weha
dirêj, sorîkur ku weha çirûsk jê diçe û dibiriqîne, dîtiye?
Bi rastî jî rîha wî mîna şewqa tavê dibiriqand. Li ba tu rîhsoran,
rîheke weha nedîtibû. Rîha wî pêl bi pêl û hem jî gûr
bû. Mîna daristaneke sor bû jî.
- Ma gava Hesinkerê Kulek çav li vê rîhê bikeve, ji qonaxa
çil rojî dê ji ber rabe, ranebe? Bibêjin, ji nuha û pê ve, Jcî dilcare
gumanan ji rîha min bike?
Gêrîkên zerî bi awayekî bi heyran bang kir:
- Çi bû? Te ev rîh ji ku peyda kir, heeey Serokê me?
Gêrîkî got:
- Hij, bang nekin!
Bi rastî jî gêrîkê zerî yê herî kal bi vê hunera xwe ya rîhê,
seroktî heq kiribû.
Got:
- Hij, dengê xwe bibirin û li vê derê binihêrin.
Qelîjteka zinêr nîjanî wan da. Gêrîkên zerî kulmijîn wê
derê, lê nihêrîn ku termê gêrîkelcî li wira dirêjkirî ye. Rîha wî
jî tune bû.

- Werin vê derê û guhên xwe bidin ber devê min. A, min
ev rîhsor kujt, rîha wî jî jê kir û min bi xwe vekir. Hela, baj
li min binihêrin, ma tu ferqa min û rîhsorekî heye?
Hêdîka got:
- Tune ye. Serokê me, tu bûye rîhsorekî temam. Hesinkerê
Kulek jî nilcare tê derxîne ku tu ne rîhsor e.
Serok bi quretî keniya û got:
162
- Min weha pê zeliqandiye ku ger fîlek xortima xwe lê babide
û bikjîne, nikare tayekî jî jê rake.
Gêrîkên zerî bang kir:
- Bijî! Bijî Serokê me! Em ê ji nuha û pê ve, ji te re bibêjin;
Serok... Serokê me yê mezin...
- Ger ji desrên we bê, her yek ji we jî rîhsorekî bikujin, rîhên
wan jê bikin û bi çenqa xwe ve bizeliqînin. A, wê gavê,
tu kes dê nikaribe tê derxîne ku hûn gêrîkên zerî ne. Hûn ê
jî li welatê rîhsoran, wek ku hûn li mala bavê xwe ne, destê
xwe kil bikin û serbest bigerin. Hûn ê wan bi hevdu bidin
kujtin û heyfa me ji nesilên gêrîkan hilînin. Kêfa min pir hat
ku hûn ji min re dibêjin, Serok
- Her yek ji me dê sê gêrîkan bikujin û rîhên wan werbigirin.
- De, rêya we vekirî be.
0 gêrîkên zerî di tariya li ber desrê sibehê de, tavilê ji ber
çavan wenda bûn û çûn.
Serokê zeriyan jî berê xwe da jikefta Hesinkerê Kulelc Hesinkerê
Kulek li jikefta xwe, bi awayê ku lingên xwe kijandibûn
ber zikê xwe, razayî bû. Li ber serê wî jî sê rîhsorên pir
ciwan hebûn. Serokê zeriyan fikirî û got ku gelo ez li vê derê,

van hersê ciwanan jî tevî vî Kulekî bikujim. Kêra xwe kijand
û ket hundur jikeftê. Yekî ji nijka ve ling avêt ber wî û ew li
ser serî li erdê ket.
- Raweste, qedexe ye!
Gêrîkê zerî got:
- Ez Serok im. Ez Serokê rîhsorên li paj Çiyayê Qaf im.
Ma li ba we, mirov ling diavêje ber mêvanan û weha mazûbaniyê
dike? Tu nema bû ku serê min perçe perçe bûbûya.
Rîhsorekî ciwan doza lêbihurînê lê kir:
- Bibuhure, Hosteyê me raketiye...
Serokê zeriyan got:
163
- Wî zû jiyar bikin, zû a nuha! Ez ji devera ku qonaxa çil
rojî ye, hatime. Fîlan welatê me jewitand, talan kir û gêrîkên
me kirin hêsîr. Min ruhê xwe bi zorê xelas kir û ez hatime ba
wî.
Rîhsorê ciwan Hoste jiyar kir û ew û Serokê zeriyan bi
hevdu dan naskirin.
- A, ev ji paj çiyayên Qaf rê. Ev jî Rîhsorê çiyayê Qaf e...
Ji qonaxa çil rojî hatiye.
Hosteyê Kulek ji yê nuh hatibû pirsî:
- Hevrêyo, tu çawa hatî?
Serokê zeriyan bi awayekî westiyayî, bêxew û situxwar got:
- Teyreke mezin heye, navê wê legleg e. Teyreke dilpak,
mêrxas, nefispiçûk û qencîxwaz e. A, wê ez li ser baskê xwe
kirim û anî vê derê, ba te.
- Kê ji te re got ku ez li vira mim?
Serokê zeriyan bijirî û got:

- Leglegê got.
- I^egleg ji ku dizane ku ez li vê derê me?
-Wêtudîtiyî.
- Hella hella... Wê leglega mezin a li ezmên, ez di vê qelijteka piçûçik de çawa dîtime?
Serokê zeriyan got:
- Legleg weha ne. Çavên wan gêrîka rej a li ser kevirê rej ê ku qonaxa çil salî dûr e, dibîne. Wê ez jî weha dîtim. Gava fîlan welarê me şewitand, hilwejand û piraniya me kujtin û yên man jî hêsîr girtin, ez jî reviyam. Min xwe li qorê Çiyayê Qaf girt. Ez li wê derê di nav berf û zinaran de mam. Li ser qotê Çiyayê Qaf tu xwarin peyda nabe. Çavên min ji nêza nema didît. Gava ku tu taqet di min de nemabû, ez li ser berfê ketibûm û tu nemabû ku min ruhê xwe teslîm bikira, dengê xijxijeke hêdî hat min. Pêlên germahiyekê xwe bera ser min da û min bi dû wê re dengek jî bihîst. Wî dengî ji
164
min pirsî û got ku hey mexlûq, tu ins î, cins î. Ji tirsan, bêyî ku ez çavên xwe vekim, min bersiva wê da û tijrên hatibûn serê me, bi zorê jê re gotin. Min jê pirsî ku hela tu kî yî. Wê got ku ez legleg im, hema devê xwe veke û tu çi dbcwazî bixwaze. Taqet di min de nemabû, ez ji nêza, ji hal de ketibûm.
Min ji wê re got ku ez birçî mim, zikê min têr bike da ku çavên min vebin, em ê pijtî wê bipeyivin. TavUê nektar û navika kulîlkan dan min. Çavên min wê gavê vebûn. Min ji wê re got ku ez rîhsorek im, tu dikarî min bibî ba rîhsoran? Wê ez di qelîjteka zinarekî de vexistim, gelek nektar û navika kulîlkan jî danîn ber min û bêyî ku tu tijtî bibêje, firiya çû.

Min tam pijtî pênc rojan dît ku ew bi paj de vegeriyaye. Ez ji kêfan dikira dîn bûbûma. Wê got ku min peyda kir, li qotê çiyayê din ê mezin hesinkerek heye. Rîhsorên hemû dinyayê jî li wê derê ne. Ji min re got ku ez ê te bibim wê derê.
Min jê re got ku bijî, her hebî, min bibe wê derê. Wê ez li ser baskê xwe kirim, ez lcirim nav perîkên xwe yên germ û xwej... Em ji wira firiyan û wê berî bîstikekê, ez li wê derê, li paj wî jujikî danîm.
Hosteyê Hesinker jê re got:
- Tu bi xêr hatiyî.
Ji xwarina xwe da wî. Bi wî re dûr û dirêj peyivî. Bala xwe pir da rîha wî, kontrol Icir, li esil û feslê wî pirsî. Baweriya xwe pê anî ku ev rîhsorek e û hem jî Serokê rîhsoran e.
Kêfa xwe anî û got:
- Birayê min, pêwîstiya min, pir bi gêrîkekî wek te hebû.
Tu bi xêr û xwejî hatiyî, ser çavan hatiyî. Cîhê te li ser serê me û çavên me heye. Do, komeke gêrîkên zerî yên peyayên fîlan ku rîhên wan sorboyaxkirî û xwe xistibûn dilqê rîhsoran hatin vira...
Serokê zeriyan bi tirs û taswas û pirsî:
- Çi bi wan hat? Ew nuha li ku ne? Ew gêrîkên zerî welatê
165
me jî, ew gêrîkên zerî... Gidî Hosteyê min, divê em wan zû peyda bikin.
Hosteyê Hesinker keserek lcijand, ji êjê dilê wî diperitî.
Got:
- Em êdî nema dikarin wan peyda bikin. Rîhsor ew li hember min paraztin. Ez bbcwazim jî bimirim jî ehmeqên

me tayeke rîha wan î zer bi tenê jî nadin min.
Serokê Gêrîkên zerî hêvî da yê Kulelc:
- Ez ê wan ji te re peyda bikim, tu qet li ber nekeve, birayê min î Hesinker. Ez ê baweriya rîhsorên te pê bînim ku ew gêrîkên zerî ne û gêrîkên zerî jî xayin in.
Serokê Gêrîkên zerî û Hesinkerê Kulek bi kêf hevdu himbêz kirin. Kuleko dê çawa kêf nelcira, di nav ew qas ehmeqî de, biaqilekî ku alîkariya wî dikir hatibû peydakirin. Bi ser de jî ew rîhsorekî bi esil bû û welatê wî jî li qûntara Çiyayê Qaf bû. Welcî din jî rîha wî ya sor, nedijibiya tu rîhan. Bi ser de jî rîha wî ya direj bûbû jewq û ronahiyek û xwe ji çenga wî bera ser sînga wî ya fireh dabû.
Gêrîkê Kulek bi hesreta germahiya dostaniyekê bi kêf û bi ewleyî difikirî. Digot ku deng ji destekî nayê û difikirî. Ew di zewq û mestbûna filcirandinê de bû. Xuya ye ku vî Serokî, vî Rîhsorê kal pir kijandiye û pir bi aqil û kone ye jî. Bi vî Rîhsorî gelek pirs dikaribûn bihatana çareserkirin.
Wê sibehê, hemû çiya, zinar, rê, hêsar, beyar, rexên co û cobaran, hundurê gol, gomik û kaniyan, nava daran, ji nijlca ve bi kulîlkan ve hatin dagirtin. Bêhna kulîlkan a xwej pêl pêl li derûdorê belav bû. Ewrên spîboz li jorê, li aliyê bajûr ji dûr ve bilind bûn. Dinya bi ronahiyeke pijtî baranê diçûrisî. Gêrîk ji mûristanên xwe, ji qelîjtekên zinaran û ji jikeftan derketibûn û xwe dabûn ber tavê û rîhên xwe dijikinîn. Bi awayekî rehet û mestbûyî meydana rast û fireh dadigirtin.
166
Gêrîkê Kulek jî derketibû devê deriyê jikefta xwe, pijta xwe dabû darikekî, xwe dabû ber tavê û bi Serokê gêrîkên

zerî re dipeyivî. Ji suhbeta Serokê gêrîkên zerî rêr nebûbû û li hember kuJtur û jorejgeriya wî, devê wî ji hevdu çûbû.
Ji xwe re digot:
- Di nav van gêrîkan de, sê gêrîkên din ên weha hebin, min ê ne fîl bi tenê, mirov jî ji dinyayê derxistana.
Ji ber ku hevalekî weha biaqil, rîhsorekî weha dost peyda kiribû, di nav bextiyariyeke mezin de vedigevizî. Ji gava ku xwe ji ser baskê Silêmanê DunikiJ çeng kir û hate vê derê û vir de, ev cara yekem bû ku ew li gêrîkelcî weha biaqil rast dihat. Bi ser Serokê gêrîkên zerî de can dida. Ger ew ê rojekê zora fîlan bibin, ev ê bi saya aqilê Serokê gêrîkên zerî be. Ev çi gêrîkekî çeleng bû. Pijta wî zipîzer, çavên wî girs, wek çavên mêja hunguv, meqesokên wî xurt, rîha wî mang dida, çîpên wî wek çîpên gêrîkekî siwarî xurt û bi lez bûn. Heta gîhajtibû vî temenî, gêrîkê ku bikarîba bi temamî ji hevdu falim bikira, bi tenê Serokê gêrîkên zerî bû.
Serokê gêrîkên zerî jî çîpên xwe dirêj kiribûn, xwe li ber tavê zulia dikir û xwe rehet dikir. Pir westiyabû, feqîro dê çi bikira, ji bin lingên fîlan xelas bûbû û taaa ji qûntara Çiyayê Qaf hatibû vira. Gêrîkên wê derê, ne weha bûn, li bajarên wan ên di bin erdê de, serayên wan ên sê, pênc, heft tebeqeyî hebûn. Weha zû bi zû jî teslîmî fîlan nebûbûn, heta dawiyê û heta ku hêza wan hebû, jer kiribû. Piraniya gêrîkên Çiyayê Qafxwe li çiyayan girtibû, tevî ku bê hêvî bûn jî jerê xwe yê li hember fîlan didomand.
Ji roja ku hatibû, cara yekem pirsî:
- Hosteyo, hûn li vê derê çi dikin? Ma hûn Ii hember fîlan jer dikin?

Heta nuha, her wî serpêhatiyên xwe gotibûn. Hosteyê Kulek jî ji ber ku di derheqê tu tijtî de, pirs jê nehatibû kirin,
167
kêfxwej bûbû.
Yê Hesinker bersiva wî da:
- Birayê min î Serok, em nuha dipên. Şerê bi fîlan re ew qas ne hêsan e.
- Qet ne hêsan e, lê ma qet çêdibe ku mirov weha dest û ling girêdayî raweste? Dû re, rîhsor hingî betal bimînin, dê bibin tiral û şer ji bîr bikin.
Hesinkerê Kulek bi meraq pirsî:
- Birayê min î Serok, fîl pir mezin in û gêrîk jî pir piçûk in. Ez bi rojan, bi mehan û bi salan difikirim, min tu rê ji bo jerê li dijî fîlan peyda nekir. Mirov bi wan re çawa jer dilce?
Serokê gêrîkên zerî gotina wî tesdîq kir:
- Rast e. Ger em hemû gêrîkên wê jorê bicivînin û têxin jer, fîlek bi tenê dê me hemuyan bikuje. Dibêjin welatek heye ku gêrîkên wî welatî, bi qasî fîlan girs in. Lê ew welat pir dû re, me xeber bida wan gêrîkan û ew jî bihatana û me ji vê hêsirtiyê rizgar bikirana.
- Ew ê bên. Ez wan nas dikim. Ew ê fîlan biqewirînin û dû re jî ew ê me bikin hêsîr. Em ê li çareya serê xwe binihêrin.
- Hosteyê min, em nikarin li çareya serê xwe binihêrin. Fîl pir mezin in.
- Bêhêvî nebe. Dibe ku em rêyekê peyda bikin, birayê min î Serok. Binihêre bê min çi lcir; min rîhsor jand her welatî, nav gêrîkên hêsîr. Wan rîhên xwe jê kirin û xwe kirin wek gêrîkên din, bi wan re dixebitin, bi wan re zilmê dibînin û

birçî dimînin. Wekî din jî ez bi jev û bi roj, li ser fîl û gêrîkan û li ser fîl û gêrîkên berê pirtûkan dixwînim. Peyayên min jî bê rawestan pirtûkan dixwînin. Em li vê derê pirtûkan dbcwînin û difikirin, hemû birayên me yên gêrîkên dinyayê pirtûkan dixwînin, dixebitin û difikirin.
Serokê gêrîkên zerî got:
168
- Tu tijt ji vêya dernakeve. Bi xwendina pirtûkan û bi xebata di nav gêrîkên hêsîr de tê Icirin, zora fîlan naçe ku...
- Binihêre, birayê min î Serok, li min guhdarî bike, ez wan bi rêxistin jî dikim... Gava rojekê, rêyek bête peyda kirin û hemû gêrîk êrîjî fîlan bikin...
Serokê gêrîkên zerî dest bi ken lcir. Dikeniya dikeniya û her dikeniya.
- Tu bi çi dikenî, birayê min î Serok?
Serokê gêrîkên zerî hingî dikeniya, nikarîbû bersiva wî bida.
- Ez dike... dike... dikenim ku...
- Tu bi çi dikenî? Ma gotinên min pir komîk in?
- Pi... pi... pir...
-Ji bo çi?
Serokê gêrîkên zerî keniya keniya û dû re hebekî bi ser xwe de hat. Ruyê wî sorîkur bûbû, dikira bifetisiya.
Got:
- Binihêre, Hosteyê min! Hosteyê min î egîd î mêrxas î jêr, ma mirov qet dikare zora fîlan bibe? Ji gava ku ev dinya bûye dinya, kê dîtiye ku gêrîkan zora fîlan biriye? Ev dinya weha ye û qet jî nayê guhertin. Fîl fîl e û gêrîk gêrîk e... Fîl dê bi rê ve bibin, ev karê wan e, gêrîk dê bixebitin. Fîl dê li

ser pijtê vekevin, xwarinên herî xwej bixwin, lcincên herî
xwej li xwe bikin û di serayên herî muhtejem de rûnin...
Gêrîk jî dê bi halekî xerab, sal duwanzdeh meh bixebitin û
di dawiyê de, tijtên xwe bidin fîlan û ew ê jî ji nêza bimirin.
Ev qanûna xwezayê ye. Qanûna mirovan, a wan mirovên
xwe pir diecibînin û xwe mexlûqên xwezayê yên pîroz dihesibinîn
jî weha ye. Ev dinya weha hatiye û dê weha biçe.
Hosteyê min hela bifikire, bifikire birayê min, ger em li vira
bi qasî çiyayekî gêrîk li hevdu bicivin û fîlek bi tenê êrîjî me
bike, dê çi bi me bê?
169
Hesinkerê Kulek cara yakem bi guman li hundurê çavên
wî nihêrî. Filcirî û got ku ev ne zeriyek be. Ev zeriyekî xayin
e... Dû re jî ji xwe re weha filcirî ku çavên vî Serokî tirsiyane.
Ma gêrîkekî ku ji qetlîameke weha mabe û ketibe ber xezeba
fîlan, ew qas ne bêhêvî be, dê çi be?
Yê Hesinker jê re got:
- Heqê te heye. Heqê te heye, lê gêrîk li vê dinyayê mexlûqên
herî xurt in. Ger fîl hîn xurttir bin jî divê rêyeke ku mirovî
ji bin destên wan rizgar bike, bête peydakirin. 0 hem jî
dê bête peydakirin!
Serokê gêrîkên zerî got:
- Lê em ji bo vêya jî tu tijtî nakin û tu çalakiyan li dar naxin.
Çalalcî pêwîst in, qet nebe, divê em wek gêrîkên me jer
bidomînin. Ez qet carekê jî nefikirîm ku em ê bikaribin zora
fîlan bibin, lê dîsa jî jer pêwîst e. Ger em zora wan nebin jî
divê em jer bikin. Hêvî bi tenê di jer de ye.
Hesinkerê Kulek jî weha fikirîbû, lê negîhajtibû tu encamê.

Hêvî bi tenê di jer de bû, lê di jerekî çawa de bû? ma jerê bêhêvî hebû? Şerekî ku bi bêhêvîtiyê dest pê lciribe, ne tu jer e, mirin e. Awa û celebê jer hene. Tu ê bi hêviyê dest bi jer bikî, lê tu dikarî têk jî biçî, ew tijtekî din e. Lê ya girîng ev e ku divê tu bi hêviyê dest bi jer bikî.
Wî ev fikirên xwe ji Serokê gêrîkên zerî re negot.
Bi tenê weha got:
- Yên we ji bo ku zora fîlan nebin jer dikin. Ev dînîtî ye.
Ma mirov ji bo bi ser nekeve, jer dike? Gêrîk dê metodekê peyda bikin ku bikaribe zora fîlan jî bibe.
Serokê gêrîkên zerî dîsa keniya:
- Tîq tîq tîq... Dê peyda nebe, peyda nabe. Ma zora fîlan diçe?
Hesinkerê Kulek bi dengekî hêl got:
- Zora wan diçe. Em ê rêya ku zora fîlan dibe, peyda bi-
170
kin. Yên ku ruh didin jî û distînin jî gêrîk in. Em ê zora fîlan bibin...
Serokê gêrîkên zerî bang kir:
- Ger weha be, wê gavê jer bikin. Mirov weha li serê çiyayî rûne, nikare zora fîlan bibe.
- Rêyekê wê...
Tam di wê gavê de, li meydanê hengameyeke çêbû ku ji gava ku Hesinkerê Kulek hatiye vira û heta nuha, hengameyeke weha nebihîstibû. Mirovî digot qey çiyayê pir mezin di ortê de perçe bûbû. A, hengameyeke weha bû. Gêrîkê Kulek î Rîhsor tavilê ber bi meydanê ve baz da ku çi bibîne, meydan bi gêrîkan ve hatiye dagirtin, mirov axê biavêje li erdê

nakeve... Rîhsorekî ciwan jî derketibû ser jaxê diriyekê yê
lierî bilind û bi jewk û bi heyecan dipeyivî. Dengê wî yê bilind
li çiyayan olan dida.
Wî digot:
- Ne fîl, ne rîhsor! Ne fîl, ne rîhsor, bijî gêrîkên azad û serbixwe...
Û bejek ji gêrîkên li meydanê, jê re li çepikan dbcin.
Yê li ser diriyê dibêje:
- Em ê welatên gêrîkan vala bikin û hemû gêrîkan, hemû
gêrîkên dinya û kaînatê bikijînin vî çiyayî û dest bi jer bikin.
Ne fîl, ne rîhsor û ne jî gêrîkên dest bi tûyik, em ê bi gêrîkên
hêsîr bigihêjin rizgariyê...
0 çepik pir dibûn, xurt dihatin lêxistin û gelek gêrîkên din
didan ber xwe.
- 0 ancax gêrîkên hêsîr dikarin xwe rizgar bikin. Tu pêwîstiya
me bi yên dest bi tûyik tune ye. Ne gêrîkên dest bi
tûyik, ne jî fîl, bijî gêrîkên hêsîr ên azad û serbixwe. Em ê çavên
fîlan derxînin. Fîlên ku çavên wan kor bibin, nikarin
welatên fîlan bibînin û pijtî wê jî ew ê rêya xwe jaj bikin, di
deryayê de werbin û bimirin. Bi vî awayî, dinya dê ji fîlan
171
xelas bibe.
Çepik pir ecêb lê diketin.
Yê ku digot, ne yên dest bi tûyik û ne jî fîl pir peyivî. Gava
ji ser diriyê daket, di nav xwêdanê de mabû, ji hal de ketibû.
Gêrîkên ku jê re li çepikan dixist, ew li ser milên xwe kir.
Pijtî wî, gêrîkekî dirêj î reşîqîr derket ser diriyê. Ji ber ku
zikê wî tazî bû, sitriyên diriyê di zikê wî de rabûn.
Dest bi peyvê lcir:

- Hevalno, rîhsorno, peyva min ji bo we ye. Li min guhdarî bikin, guhên xwe baj bidin min... Em ê a nuha dest bi jer bikin. Em ê koka fîlan biqelihînin. Gêrîkeeek, tew gêrîkekî sor berberî kaînarê ye. Fîl ew mexlûq in ku qet zora wan naçe. Tu hêz nikare zora wan bibe. Em ê jî nikaribin zora wan bibin, lê em ê dîsa jî jer bilcin. Em ê ji konên pîrê konan bidin hevdu, em ê wan li ser rêyên fîlan raxin û gava fîl bên, lingên wan dê tê bieliqin... Belê hevalno, em ê nilcaribin zora fîlan bibin, lê em ê wan têxin nav konên pîrê. Ez do bi Serolca pîran re peyivîm. Seroka pîran got ku her pîrek dê ji we re, heft erîn, yanî heft erînên gêrîkan kon birêse. Ne fîl bi tenê, hûn dikarin vê dinyaya mezin jî têxin van toran, bidin hevdu û biavêjin ba rojê. Lê fîl dê mexlûb nebin. Ev dinya dê neyê guhettin... Em gêrîk, em ê jer bikin. Ma pijtî ku di destên me de, ew qas konên pîrê hebin, em ê ji bo çi jer nekin, ne weha? Bila ew Hesinkerê Kulek î newêrek ê ku rêya me dibire û nahêle em jer bikin, bimire!

Dengê qelebalixiyê meydan hejand:

- Bila bimire!

- Gava ku me jî fîl û hudhud xistin torên xwe û azadiya xwe bi dest xist, em ê wê gavê, hemû mêjên dinyayê bidin pîrên hevalên xwe. Ger ji nêza bimire jî tu gêrîk dê li vê dinyayê dest mêjeke jî nedin...

Ji dengê qelebalixiyê meydan hejiya:

172

- Ger bimire jî!

- Pijtî ku konên me yên pîrê hebin, em...

Li ser konên pîre û li ser zexmbûna wan hîn dûr û dirêj

peyivî:
- Konekî pîrê dikare ne fîlekî, çil qantirî jî zevt bike. Konelcî pîrê dikare ne fîlelcî, însanekî jî zevt bike. Konekî pîrê...
0 mîna serlejkerekî biserketî bi serbilindî, ji ser diriyê daket. Meydan ji cepikan dikira hilwejiya.
Hesinkerê Kulek li wê derê, li kêleka meydanê, bi Serokê gêrîkên zerî û hersê rîhsorên ciwan re li ser lingan rawestiyabû û ji hêrsa dîn dibû.
Digot:
- Zirt zirt. Zirt zirt... Hey fortekên heram. Hey gidî zirtoleno!
Tam wê gavê, xortekî çavsêqozî, simbêljor ku rîha wî bi erdê re dikijiya û porê wî xwe bera ser pijta wî dabû, derket ser diriyê. Piçekî devlalik bû, lê serrast dipeyivî.
Bi awayekî pir hêdî, bi xwe bawer û îqnakir dipeyivî. Gava heyecana wî bilind dibû, gêrîk li devlalikbûna wî hay nedibûn û bi baldariyeke mezin guhdarî dikir:
- Divê em realîst bin, hevalno. Em ê qet tu carî û qet bi tu awayî zora fîlan nebin. Pijtî ku em nikarin zora fîlan bibin, ma me bikarîbûya zora wan bibira, ji gava ku dinya ava bûye û heta nulia, em ê bûbûna hêsîrên wan, ne weha?
Meydanê bi dengekî hêl got:
- Em nedibûn!
Hesinkerê Kulek got:
- Ne ku ji gava ku dinya ava bûye, em nuha bûne hêsîrên fîlan.
Dengê wî neçû tu kesî. Dibe ku deng çûbe wan jî lê wan xwe li kerî danîbe.
Yê devlalik dewam lcir:

- Ji ber vê yekê, divê em jerê bi fîlan re û têkbirina fîlan ji hijên xwe biavêjin û em lê bifilcirin, bê em ê çawa nehêlin ku ew têkevin welatên gêrîkan, ma ne weha?
Qelebalixiyê di ber xwe de hêdî got:
- Ya herî rast ev e.
- Wê gavê hevalno, ez lê geriyam, jêwirîm û min ji yên ku mîzaca fîlan nas dilcin, min ji mahr, jahrmar û mirovan pirsî. Min mîzaca wan nas Icir. Ya yekem ev e ku fîl nikarin xwe ji ser xendekan çeng bikin. Em ê li hawîrdora welatên gêrî-Ican xendekan bikolin û fîl dê nilcaribin têkevin welarên me. Em ê fîlan kor bikin, nizanim, em ê wan têxin torên ku ji konê pîrê hatine çêkirin û biavêjin derveyî kaînatê... Ev hemû derew in. Ma tu gêrîk dikare çavên fîlan kor bike, bibêjin, ma fîlek di konekî pîrê de hiltê?
Qelebalixa ku ketibû ber hevdu bang kir:
- Hilnayêêê!
- Hevalno, divê em realîst bin û ji nuha de, em hemû rîhsor li welatên xwe belav bibin û ji bo kolana xendekan, hevwelatiyên xwe îqna bikin.
Meydan ji çepik û bangkirinê geh radibû û geh dadiket.
Gêrîkan ev rîhsorê rîhdirêj û pordirêj jî li pijta xwe kir.
Dû re jî gava hebelcî sukûnet çêbû, gêrîkekî rîhsor î piçûçik, bi qasî serê derziyê piçûçik derket ser diriyê. Ev gêrîk ew qas piçûçik bû ku gêrîkan jî ew li ser diriyê ancax bi zorê dikarîbû bidîta.
Dengê vî gêrîkê piçûçik pir xurt bû.
Wî jî got:

- Hevalno, divê em realîst bin. Ma em tu carî dikarin bi qûmê çavên fîlan kor bikin. Li gora ku ez dizanim, çavên fîlan ji xwe, ew qas hindik dibînin ku ger em wan kor bikin jî dê tu tijt neyê guhertin. Fîl bi guhên xwe dibînin. Hevalno, bibêjin, ma em dikarin guhên fîlan jê bikin, ma hêza me têra
i74
jêkirina guhên wan ên wek merjan dike?
Qelebalixê bang Icin
- Têrê nakê!
- Ger em bên ser meseleya konê pîrê...
- Qelebalixê got:
- Nabe, nabe! Dev ji xendekê jî berde.
- Min agahdarî wergirt ku tu xendek xwe li ber tu fîlî nagire, her fîl dikare xwe ji ser xendekê biavêje û derbas bibe.
Gêrîkan bang Icir:
- Derbas dibe!
- Li vê dinyayê, hêza ku bikaribe zora fîlan bibe, tune ye. Hêza ku bikaribe zora fîlan bibe, hîn nehatiye afirandin.
Qelebalixê dîsa bi dengelcî xurt got:
- Nehatiye afirandin!
- Wê gavê, divê em çi bikin, heeey hevalno, heeey mexlûqên kaînata me yên pir hêja, herî hêja, hûn rîhsorno, Xwedê hûn bi pesin çêkirine û hûn li ser serê van gêrîkan kirine siltan. Wê gavê, divê em çi bikin?
Kirtînî ji gêrîkan çênebû. Hemuyan bi baldariyeke mezin guhdarî dikir û li devê gêrîkê piçûk dinihêrî.
- Li gora ku li vê dinyayê, hêz di ser hêza fîlan re tune ye, em ê jî ji hêza fîlan îstîfade bilcin û rizgar bibin. bejeke fîlan

heye ku ew bej nikare bi qasî Siltanê Fîlan ji îmkanên ku bi
keda gêrîkan çêdibin îstîfadeyê bikin. Em ê ji wan fîlên feqîr
ên ku leglegê ew ji hêlînê derxistibûn re bibêjin, ger hûn alîkariya
me bikin û me ji bin destê fîlan rizgar bilcin, em ê jî
we, nesilê we heta qiyamerê, bi nektar, navilca kulîlk û kêzikan
xwedî bikin. Em ê ji we re, serayên krîstal jî ava bikin.
Ger hûn fîl nebin, em gêrîkên piçûçik nikarin bi fîlan re derxinin
serî. Bibêjin, ma em dikarin bi wan re derxînin serî?
- Em nikarin!
- Wê gavê, bijî biratî û hevkariya fîl û gêrîkan! Fîl û gêrîk
175
bi hevdu re... Bimirin torperest, çiyagerok, xendekperest, hesinker
û yên dest bi tûyik! Bijî hevkariya gêrîk û fîlan...
Meydana mezin deng veda:
- Fîl û gerîk dest bidin hevdu...
Gêrîk bi kêf û heyecan, tev de çûn û hatin. Di bin jewqa
tavê de, çavên bi milyaran gêrîk çirûsîn.
0 gêrîkê piçûçik xwe nepbcand û ji ser diriyê xwe çeng kir
erdê û di nav çîpên gêrîkên din de wenda bû. Gêrîkan ew
peyda kir û li ser kolîna xwe kir.
Serokê gêrîkên zerî yê li kêleka Hesinkerê Kulek rawestiyabû
ji devê xwe revand:
- Rast e. Vî jî rast got.
Hesinkerê Kulek di bin çavan re lê nihêrî. Ev demek bû
ku her rîhsorek ji ser diriyê dadiket, vî gêrîkê Serokê zeriyan
di ber xwe de tijtin digotin, lê Hesinkerê Kulek nikarîbû
fahm bikira bê wî çi digotin.Ya rastî, wî ji fikirên her gêrîkî
re gotibû erê. Serokê gêrîkên zerî peyva 'rast e' ji devê xwe

revandibû, lê çi feyde, Kuleko carekê ew bihîstibû. Nuha, wî dê ev çawa pîne bilcira, pînekirin qet ne mumkun bû. Kuleko jî çawa weha bi guman û bi tirs li wî dinihêrî. Tu çareya Serokê gêrîkên zerî nema bû, divê biajota ser wî, belkî dilcarîbû bi tenê bi ajotina ser wî, rêya xelasbûnê peyda bikira.

- Hemû rast dibêjin, ne weha Hosteyê min?

Gêrîkê Kulek ji hêrsa Icir ufe uf.

Serokê gêrîkên zerî dewam kir:

- Em dikarin fîlan kor bikin.

- Ehmeq!

- Em ê fîlan bi konê pîrê...

- bê hij!

- Bi fîlan re hevkarî...

- Gêjo, min jî tu bi tijtekî dihesiband. Bi ser de jî tu Serokê welatekî gêrîkan ê mezin e. Welcî din jî tu rîhso...

176

Devê wî negeriya ku bibêje, tu rîhsorek e. Ji ber ku rîhsorekî weha kal nikarîbû ji van gotinên beredayî re bigota ku ev rast in. Gêrîkê Kulek di jiyana xwe de gelek tecrube jiyabûn. Ji ber ku fikira xwe bi carekê gotibû, pojman bûbû. Ji ber ku vî Serokê gêrîkên zerî bi devê xwe, xwe dabû dest, dikarîbû bi hin lcarên ku nedihatin fikirandin re rabûya. Serokê gêrîkên zerî dikarîbû hemû gêrîk lê sor bikirana û ew bida lînç lcirin. Ev Serokê gêrîkên zerî yekî çi bi ziman bû. Bi jev gava ew di xew de ba, dikarîbû ew bikujta... Ger tu tijtek nekira, dikarîbû bireviya.

Gêrîkê Kulek ji nijlca ve dest bi ken lcir û got:

- Wey tu her hebî, birayê min î Serolc Tecrubeya te ji ya

herkesî bêtir e... Bibuhure, min di destpêkê de fahm nekir û ji ber vê yekê, min ji van fikirên xwej re got ku bêhij. Ez dizanim ku her fikir pîroz e.
Xayintî çi qas xwej xuya bibe jî ehmeqî ye... Gêrîkê Serok ji van gotinên Kuleko tavilê bawer kir. Ji ber ku wî xwe herî biaqilê dinyayê dihesiband.
Bi kêf bang Icir:
- Her fikir pîroz e. Fîl çi qas xurt bin jî bila bibin, em ê bi van fikiran zora wan bibin.
Gêrîkê Kulek got:
- Rast e. Kengî be, em ê zora fîlan bibin.
Hîn ew weha dipeyivîn, gêrîkekî xwe çeng kir ser jaxê diriyê yê herî bilind û got:
- Hevalno, gêrîkên sor î kedkar ên berêz, muhtejem û pîroz, fîlan koka me qeland û em kirin hêsîr... Ez dizanim, mirov nikare ji destên fîlan xelas bibe. Fîl li vê kaînatê, mexlûqên herî xurt in. Hûn jî bi vêya dizanin û ez jî pê dizanim û hemû kaînat jahidê vê ye. Hesinkerê Rîhsor ê Hosteyê me yê mezin jî bi vê rastiyê dizane. Hevalê wî Serokê gêrîkên Çiyayê Qafê ku ji ronahiya çavên wî jî hêjatir e, vêya dizane.
177
Gêrîkê Kulek ji hêrsa dîn dibû û bang kir:
- Rast e! Rast e!
Hem ji hêrsa dîn dibû û hem jî ji van gotinên bîçoberanî re, her digot ku rast e.
Serokê gêrîkên zerî ji ber îqnabûna Gêrîkê Kulek mest bûbû. Got:
- Rast e, rast e, rast e!

Gêrîkê Kulek bang kin
- Em dizanin.
- Li vê dinyayê, ne gêrîk tu hêz nikare zora fîlan bibe. Fîl jî nikarin zora fîlan bibin, însan jî... Bi tenê hêzek dikare zora wan bibe, ew jî birayên me gêrîkên siwarî ne. Li vê kaînatê, hêza ku bikaribe zora fîlan bibe, gêrîkên siwarî ne. Gêrîkên siwarî yên çîpdirêj in.
Serokê gêrîkên zerî bang kin
- Rast e, gêrîkên siwarî yên çîpdirêj in!
Gêrîkê Kulek ji mecbûrî, peyva wî dubare kir:
-Gêrîkên siwarî ne, rast e!
Hêdîlca, di qoziya çavên xwe re li Serokê gêrîkên zerî nihêrî. Serokê gêrîkên zerî bi serbilindî desrên xwe di hevdu de didan. Û Hesinkerê Kulek her li Serokê gêrîkên zerî dinihêrî, ji tepelika serê wî heta nenûkên lingên wî, ew bi çavan sax dikir. Êdî ew ewle bû ku ev ne rîhsorek e.
Gêrîkê li ser diriyê yelcî dirêj bû, hew hestî û çerm mabû. Por û rîha wî tev li hevdu bûbûn. Bêvila wî tûj û pembe bû, gava dipeyivî, zengiloka wî hildikijiya û dadiket.
- Em ê hezar û pênc sed gêrîkên siwarî bînin vê jikeftê. Tam çar milyar gêrîk dikeve vê jikeftê. Em ê hezar û pênc sed gêrîkî têxin vê jikefta ku çar milyar gêrîk dikevê û em ê derziyên fîlan li wan bixin. Pijtî ku me derziyên fîlan li siwariyan xistin, em ê hemû xwarinên dinyayê kom bilcin û bi-
178
din wan. Pijtî jej mehan, gêrîkên ku derziyên fîlan li wan hatibin xistin, dê bi qasî pênc fîlan, deh fîlan mezin bibin. Her gêrîkek ji van gêrîkên ku bi qasî pênc fîlan, deh fîlan

mezin bibin, dê bibe cinawirek. Her yek ji wan dê fîlelcî têxe nav meqesoka xwe û bike du jeq. Em ê gêrîkên xwe yên cengawer biajon ser fîlan, êdî Xwedê jî nikare wan zevt bike. Di nav fîl û gêrîkên siwarî de, dê jerekî pir giran çêbibe. Û gava roj biçe ava, li vê dinyayê dê tu fîlekî sax nemîne. Gêrîkên siwarî dê hemuyan bide ber meqesokên xwe û tam di ortê de, bilcin du jeq. Birano, gêrîkên rîhsor, peyva min rast e!
Meydana mezin hejiya:
-Raste!
- Tu, heeeey Serokê gêrîkên sor ê pîroz, ma gotinên min rast înr
Yê Hesinker berdilka xwe kil kir û got:
- Rast e, rast e.
Pijtî wî jî Serokê gêrîkên zerî bang Icir
- Rast e, rast e, pir rast e.
0 Hesinkerê Kulek î Rîhsor bi dizî keniya, ji kêfa dilcira bifiriya. Di demeke pir kurt de fahm kiribû, bê ev Serok Icî ye. Ev gêrîk ji Serokê gêrîkên zerî pê ve, ne tu kes bû û yên ku ev qelebalix li vê derê civandiye jî û ew sor kiriye jî gêrîkên zerî bûn. Lê di nav rîhsoran de çawa wenda bûbûn? Mirovî dê ew çawa nas bikirana û peyda bikirana? Mirovî dê çawa bikarîba ev qelebalixa ha, îqna bikira ku ew gêrîkên zerî bûn? Karê wî zor bû. Zor bû lê ne ji derveyî îmlcanan bû. Gêrîkê pir zirav jî ji ser serê diriyê daket. Gêrîkan ew jî li kolîna xwe lcir û bi dengê 'bijî, her hebî' zingînî ji meydanê anî. Dengê wan li çiyayên bilind olan da. Dû re Serokê bîrperestan derket ser diriyê û pêjniyar kir ku divê di rêyên fîlan de, bîr bên kolan. Bi dû wî re, yê mîxperest derket ser diriyê.

Wî jî li hawîrdora welatên gêrîkan kutana mîxan pêjni-
179
yarî wan kir. Fîlan dê tu carî nikarîba pê li van mixan bikira
û têketa welatên gêrîkan. Bi dû yê mîxperest re, torperest,
avperest, diz û kelej, seyikperest derketin ser diriyê. Pêjniyarên
hemuyan jî balkêj bûn. Di nav qelebalixa meydanê de, ji
bo her yelcî, kesên ku gotinên wan tesdîq dikirin û bang dikir
digot ku rast e, hebûn.
Hesinkerê Kulek û Serokê gêrîkên zerî jî herkes tesdîq dikir.
Her kesê ku peyivî li kolîna grûpa xwe siwar bû.
Tam wê gavê, meydan tev li hevdu bû, gêrîk ketin ber
hevdu. Şûr û xencer hatin kijandin, tor û lcindir hatin avêtin
û gêrîkan ji her aliyî kevir bi ser hevdu de barandin. Ewrekî
ji tozê yê tarî girt ser meydanê. Dengê hawar û gaziyê ku mirov
ji guhan dikir, meydan da ber xwe. Serî, çîp, mil, gewde
li hewa difiriyan. Ji gava ku dinya bûbû dinya û gêrîk jî bûbûn
gêrîk, tu kesî jerekî weha nedîtibû.
Gêrîkê Kulek û Serokê gêrîkên zerî hilkijiyabûn ser bilindtirîn
jaxê diriyeke bilind, qalind û bi qasî darekê saxlem û ji
wê derê, li jer temaje dikir. Hesinkerê Kulek ji qehra dimir,
Serokê gêrîkên zerî jî di hundurê xwe de kêf dikir, dipesinî û
ji derve jî wek ku li ber ketibû xuya dikir. Lê êdî tu tevgera
wî ji çavên Hesinkerê Kulek nedireviya.
Hesinkerê Kulek pir bi taswas bû. Ev jer dê heta kengî weha
dom bikira? Dibe ku di dawiya jer de, tu gêrîkê saxlem
nemîne. Ji bo pêjîlêgirtina vê qedîamê, divê çi bilcira?
Ji rîhsorekî ciwan borîzanek xwest. Li jorê gelek borîzan
hebûn, di nav wan de, ya herî mezin neqand û anî da yê Hesinker.

Yê Hesinker dest bi axavtinê, bangkirinê, sbcêfan kir, lê kî dibihîse, lcî guhdarî dike?
Hesinkerê Kulek pir li ber diket. Heta gêrîkên ku hêviya neteweyên gêrîkan û bi saya ew qas keda wî, bûbûn rîhsor jî bi çend zeriyan xapiyabûn û hevdu dikujtin. Hem jî li ber çavan. Ger ev rîhsor biqedin, êdî gêrîk heta qiyamerê dê hê-
180
sîrê fîlan bimînin. Bi çavên tijehêsir li ruyê Serokê gêrîkên zerî nihêrî. Serokê gêrîkên zerî di nav kêfeke bêsînor de bû. Hesinkerê Kulek nexwest ew liberketina wî ferq bike. Hebekî jî keniya:
- Hevdu dikujin, bila hevdu bikujin. Li vê dinyayê hîn gelek rîhsor hene, ne weha? Li ba we jî gelek hene, ne weha?
Serokê gêrîkên zerî got:
- Hebûn, lê ew jî her ji çi sebebê bû, weha bi hevdu ketin û hevdu kujtin. Li welatê min î muhtejem rîhsorek bi tenê jî nema.
- Bila ev hevdu bikujin, hîn çêtir e. Ji xwe ev, gêrîkên ehmeq û gêj bûn. Mirina wan dê ji bo neteweyên gêrîkan bi xêrtir be. Ger gêrîkên sor ên neteweyan dê weha bê aqil bin, qet tune bin, bajtir e. Li ba me, hîn gelek rîhsor hene, bi ser de jîewbi aqil in...
Serokê gêrîkên zerî tavilê pirsî:
- Li ku ne?
Aaax, wî bikarîba cîhê wan fahm bikira... Heta Serokê gêrîkên zerî sax be, divê li vê dinyayê gêrîkekî rîhsor bi tenê jî nemaba.
Hesinkerê Kulek got:

- Li Çîn û Maçînê ne. Li welatê gêrîkên rûzer in.
- Ma rîhên gêrîkên rûzer jî sor dibin?
Hesinkerê Kulek got:
- Dibin, le. Rîhsorên wan ne weha ehmeq in, ew hevdu weha nakujin.
Serokê gêrîkên zerî di hundurê xwe de got ku hûn ê bibînin, hela bila ez wan zeriyên xwe yên ew qas bi tecrube bijînim wê Çîn û Maçîna te, tu îcar li dawetê temaje bilcî. Tu ê bibînî, ma em ê yên wê derê jî ji yên vê derê xerabtir nekin!
Tebeqeyeke tozê ya qalind xwe bera ser meydanê da. Xwîna ku ji meydanê diherikî bi guje guj ji palê dadiket û çem
181
tije dikir. Hesinkerê Kulek ji vê bilindahiyê jî ji derveyî mil, çîp, û gewdeyên jêkirî ku difiriyan û pê ve, nikarîbû tu tijt bidîta. Kir qere pere, lê gava hewildana Hesinkerê Kulek bi kêrî tijtekî nehat, borîzana di destê xwe de çeng kir, avêt meydana jer. Bêçaretiyê ew dikujt.
Tam di wê esnayê de, ji dûranê, tîqe tîqeke mîna girgira ewran teqiya. Tîqe tîqê çiya hejandin, zinar lerizandin.
Serokê gêrîkên zerî careke din xwe da dest.
Got:
- Siltanê Fîlan, Siltanê Fîlan! Siltanê Fîlan bi vî halê rîhsoran dikene.
- Siltanê Fîlan çawa bi halê me yê vê derê dizane?
Serokê gêrîkên zerî yê ji ber kêf û heyecana xwe, xwe dabû dest, derewek kir:
- Çavên Siltanê Fîlan gêrîka rej a li ser kevirê rej ê ku qonaxa çil rojî ye, ger li paj heft çiyayan be jî dibîne. Wî dikira

ez bikujtama. Ez reviyam û min xwe avêt ser berfa Çiyayê
Qaf. Fîl fêrî çiyayên bilind û zinarî nebûne, tew qet tehamulî
serma berfa çiyayî nakin.
Tîqe tîqek, tîqe tîqeke din teqiya. Tîqe tîqan erd û ezman
dihejandin û mîna guleyên topê diteqiyan.
Tam di wê esnayê de, mûcîzeyek çêbû. Tijtekî ku mirovî
qet bawer nedikir çêbû, meydan ji nijlca ve ker û lal bû. Vizîniyeke
herî piçuk jî ji wê derê nedihat. Hesinkerê Kulek
guhê xwe dayê, guhdarî kir, dû re jî bi awayekî xemgîn pirsî:
- Çi bi van hat? Ji meydanê dengê kirtîniyekê jî nayê, çi bi
rîhsorên min hat?
Serokê gêrîkên zerî got:
- Hemû mirin. Hemuyan hevdu kujt. Rîhsorekî me bi tenê
jî nema. Wax wax, waaax!
Heta ku dengê wî derket, dest bi girî kir.
- Wax wax, waaax!...
182
Gêrîkê Kulek yekî giran bû, ji çavên wî dilopek hêsir jî nedihat,
li wê derê, di cîhê xwe de rawestiyabû û tev nediliviya.
Dengê tîqe tîqên Siltanê Fîlan hîn jî bilindtir dibûn û dihat.
Toza li ser meydanê jî hêdî hêdî xwe bera xwarê dida,
dinya rohnî dibû. Gêrîkê Kulek çavên xwe qet ji meydanê
venediqetandin, ziq lê dinihêrî. Destê wî li ser dilê wî bû.
Toz daket, dinyayê dest bi rohnîbûnê Icir û tam di wê esnayê
de, ji nijka ve, tîqe tîqa Siltanê Fîlan bû hêrs û xezebeke
nedîtî ya no, tarûmarker û kujek.
Û Hesinkerê Kulek ji kêfa qêriya:
- Piraniya gêrîkên min nemirine! Şikir, jikir, jikir!

Serokê gêrîkên zerî yê ev rewj û xulxuleya gêrîkan a li
meydanê dît, ji qehran dilcira ji ser diriyê biketa û bimira.
Hesinkerê Kulek ji ser diriyê daket xwarê û çû meydanê.
Li meydanê mirî û birîndar bi ser hevdu de kom bûbûn.
Hesinkerê Kulek got:
- Şikir ji vêya re jî, ji vêya re jî. Min digot qey tu rîhsor nemane.
Li meydanê jî gêrîkên ku ji ber tîqe tîqa Siltanê Fîlan jaj
mabûn û dev ji jer berdabû, hîn her ji hevdu re sixêf dikir.
Hesinkerê Kulek derket ser darikekî û got:
- Êdî bes e! Bi ser hijên xwe ve werin. Binihêrin, bê Siltanê
Fîlan bi vî halê we çawa dikene.
Hesinkerê Kulek hîn gelek peyvên din lcirin. Tu gêrîkan
bersiva wî neda. Rîhsor bi awayekî sûcdar serên xwe xistin
ber xwe û vegeriyan quncikên xwe. Vegeriyan, lê...
Serokê gêrîkên zerî tam li pijt Hesinkerê Kulek bû, gava
ew dipeyivî, got:
- Binihêre hevalo, ma ru dibêjî qey tu ê van gêrîkên ku bi
hevdu ketine û xwîna hevdu vexwarine, dîsa bîne ba hevdu?
Ji nuha û pê ve, êdî ev rîhsor qet îfleh nabin. Ev ê heta dawiyê
hevdu her weha bikujin. Ezîtî, xwîn û fesadî ket nav wan.
183
Rîhsorên ku bûne hezar perçe, êdî dê hertijtî ji bîr bikin û bi
hevdu kevin. Çavên wan ne fîlan û ne jî dinyayê dibîne.
Gêrîkê Kulek ji ber tijtên ku qewimîbûn, hem xemgîn bû,
hem jî bi kêf bû. Şikir ku gêrîk hemû nemiribûn. Pijtî vê
teçrubeyê, divê êdî hijên wan hatibin serên wan. Pijtî vê bûyerê,
gêrîkên zerî êdî divê nikarîba ew bbcapandana.
Hatin mûristanên xwe, westiyabûn.

Serokê gêrîkên zerî got:
- Birayê min î Hesinker bi min re were, em biçin welatê min î paj Çiyayê Qaf. Ez ê li welatê xwe, serokwezîrtiyê bidim te... Ez ê nektar, navilca kulîlkan, hem jî navika kulîlkên Çiyayê Qaf li ber te bikim. Min ji te pir hez kir. Tu ê temenê xwe yê mayî, ne wek gêrîkan, wek fîlan bijî. Ger tu bixwazî, tu dikarî qûna xwe jî ji sibehê heta êvarî bixurînî. Te dît ku asasê ser berfê ye. Rîhsorên te jî hevdu kujtin. Ji nuha û pê ve, ew îfleh nabin, heta ku du heb bimînin, ew ê her çavên hevdu derxînin. Keko, were li kerê jeytên siwar nebe, ev gêrîk qîymeta te nizanin. Were em biçin welatê me. Ger tu bbcwazî pijtî bîstikekê hudhudek, ger tu hudhudî nexwazî, bila leglegek were û me bibe paj Çiyayê Qaf. De keko...
Gêrîkê Kulek î Hesinker î Rîhsor qet tu bersiv neda wî, hew hersê rîhsorên ciwan ên ku li benda wî bûn, birin quncikekê û di guhên wan de kir pise pis:
- Xortino, gidî bila hayê we jê hebe, hûn wî Serokê hevalê min dibînin, wiyê rîha wî sor? Ew Serokê gêrîkên zerî ye.
Siltanê Fîlan gêrîkên zerî xistine nav me. Şerê îroj jî wan derxist. Dikira rîhsorek jî nemabûya. Bila bala we li ser wî be, dikare bireve. Gava reviya, ger we nikarîbû ew bigirta, wî bikujin. Lawo ji bo Xwedê, bila ew pê nehise ku em pê dizanin, ew Serokê gêrîkên zerî ye.
- Hosteyê me, em nahêlin ew pê bihise.
184
HEFT
Siltanê Fîlan ji bo ku gêrîk gêrîktiya xweji bîr bikin, xwe fîl bihesibînin û hêsîrtiya wan heta dawiya dinyayê bidome,

dek û dolaban digerîne.
Gêrîkan birçî û nexwej xwe bi zorê gîhand Biharê. Lê hejmara gêrîkan a bi milyaran, Zivistanî di berfê û xelayê de daketibû nêvî. Dîsa jî gava Siltanê Fîlan ê ku Zivistanî xwarin dabû wan bangî wan kir, bi dil û can û bi minetdarî bazda.
Siltanê Fîlan got:
- Ez îsal, serayeke din dixwazim... Ev seray dê du caran li seraya min a kevin be. Hem jî di hundurê wê de dê nivînên ji perîkên çivîkan...
Ew qet li dij derneketin, bê dudilî got:
- Li ser serê me, Siltanê me.
- Ez textekî pembe jî dixwazim, ji almasa pembe ya di orta dinyayê de...
Hemû gêrîkan bi hevdu re bang kir:
- Li ser serê me, Siltanê me. Bila hema tijtê ku dbcwazî textê pembe be.
- Ez dixwazim hûn li ser van çiyayan bexçeyê vê dinyayê yê herî mezin çêbikin. Li ser ruyê erdê, çi qas tovên kulîlkan hebin, hûn ê hemuyan bînin û li vî bexçeyî biçînin.
- Li ser seran, Siltanê me. Hema bes tu bbcwazî. Hemû gêrîkên kaînatê, yên li Asyayê, Amerîkayê, Afrîkayê û Ewrûpayê jî di emirê te de ne...
- Li ser ruyê erdê, çi qas dar hebin, çi qas darên bi fêlcî û bi
185
kulîlk hebin, ez ji hemuyan dbcwazim.
- Li ser seran, Siltanê me.
- Hûn ê hemû embarên ku di bin vî çiyayî de hene, bi

nektar, navilca kulîlk, dendik, genim û gîhayan tije bilcin...
- Hema bi tenê tu emir bikî, Siltanê me.
- Hûn ê dîsa mîna par, ji xwe re tu tijtî berhev nelcin. Ez ê dîsa mîna par, xwarina we bidim we. Bi vî awayî, hûn ê ji du deveran bi hevdu re xwarinê nekijînin. Dû re, embarên min jî saxlem in, ne diz û ne tu kes ji tirsa, newêrin xwe nêzîkî wan bikin.
- Li ser seran, Siltanê me, hema bes tu bixwazî.
- Ez ê hîn gelek tijtan ji we bixwazim...
- Tu çi bbcwazî, li ser serên me.
- Ez ê mekîneyeke qûnxurandinê bbcwazim. Ma heqê Xwedê ye ku gava hûn gêrîkên min sekinîbin û Zivistanî di wê qiyameta berfê de her ku qûna min bixure, ez jev nîvê jevê derkevim derve û qûna xwe bisipêrim vê çinara bilind? Bibêjin, ma qûnxurandineke weha, bi siltanekî dikeve?
- Siltanê me, em ê mekîneya qûnxurandinê jî çêbikin.
- Ma we qet mekîneya qûnxurandinê çêkiriye?
- Me çênekiriye, lê em ê çêbikin.
- Le, we nikarîbû çêbikira?
- Siltanê me, li ba mirovan, mekîneyên qûnxurandinê pir hene. Ger em nilcaribin çêbikin, em ê ji mirovan bidizin û bînin.
- Wê gavê, hûn ji bo çêkirina mekîneya qûnxurandinê qet nexebitin, ji mirovan bidizin û bînin.
- Em ê ji mirovan bidizin û bînin, Siltanê me.
- Gêrîkên min, baweriya min bi we heye. We ji bo min, ji bo me, hertijt çekirin û hûn ê çêbikin. îroj roja sedhezarsaliya biratiya fîl û gêrîkan e. Ev sed hezar sal in ku gêrîk û fîl bi

hevdu re, wek bira û azad dijîn. Biratiya gêrîk û fîlan ji bo
186
hemû mexlûqên din bûye nimûne.
Gêrîkan bang lcir:
- Bûye nimûne!
Siltanê Fîlan ji gêrîkan pirsî:
- Ma hûn ji min razî ne?
Gêrîkan bang kir:
- Em pir razî ne.
- Hûn mirina min naxwazin, ne weha?
Gêrîkan bang kir:
- Em naxwazin, ev çi gotin e.
- Wê gavê, hûn ê ji min re ava heyatê peyda bikin.
Bêdengiyeke mezin çêbû. Germ bû, germahiya biharê.
Dinya bi temamî bi kulîlkan ve hatibû xemilandin. Ji çiyayan
pêl bi pêl bêhna kulîlkan dihat.
Ji qelebalixiyê çend dengên qels hatin bihîstin:
- Li ku derê heye? Ji çi re dibe?
Siltên bi dudilî got:
- MexJûqê ku ava heyatê vexwe, nema dimire, ew ê heta
roja qiyametê bijî. Her ji heyjtê salî carekê jî ciwan dibe.
Dîsa çend dengên qels hatin bihîstin:
- Ma em ê vê ava heyatê li lcî derê peyda bilcin?
Siltanê Fîlan êdî fêrî dengê gêrîlcan bûbû, dikarîbû dengê
pise pisê jî bibihîse.. 0 hemû gêrîk tam fêrî fîlî bûbûn. Ji ber
vê yekê, dikarîbû bi hêsanî bi gêrîkan re bipeyiviya. Hudhudan
jî xwe li ser guliyên darên bi kulîlk ên li derûdorê danîbû
û bi bêdengî li tijtên ku dibûn temaje dikir. Bi daran ve

hatibûn seyandin. Kumikên wan ên turuncî li ser daran qat bi qat wek kulîlkan vebûbûn.
Siltanê Fîlan keserek kijand û bi dengekî pir xemgîn got:
- Ez nizanim. Ax, ger min cîhê wê bizanîba, min ê ew ji zû de bianiya û vexwara.
Gêrîkekî kal got:
187
- Dibe ku li ba mirovan hebe, em ê wê jî bidizin û ji Siltanê xwe re bînin.
Siltanê Fîlan bi kerb keniya:
- Ew ne li ba mirovan û ne jî li ba tu mexlûqên din peyda dibe. Ji mirovan bi tenê Koroxlî û hespê wî yê gewr ava heyatê vexwariye. Welcî din jî Xizirê xwediyê hespê boz vexwariye. 0 îlyasê ewlîya... Ez tu mexlûqên din ên ku ev av vexwaribin, nas nakim. Ger peyda bike, bike, hûn qûlên min ên gêrîk dikarin peyda bikin. Ger mirov ava heyarê peyda bike, ma ew ê ji bo dilopeke wê, çi bide, çi nede... Binihêrin, birayên min ên gêrîk, ev ava heyatê gelekî girîng e, ger em kaniyawê bibînin...
Gêrîkekî ciwan û çeleng bang lcir:
- Em ê bibînin! Ma ne ji bo Siltanê me ye, wê gavê em ê erd û ezmên li bin guhê hevdu bixin û lcaniya ava heyatê dîsa peyda bikin. Siltanê me jî dê wê xortima xwe ya dirêj î muhtejem î pîroz têxê devê kaniyê û bêyî ku xortimê jê derxîne, ew ê çil roj û çil jevan jê vexwe. Em ê ji Siltanê xwe re, 'ava heyarê jî bibîne da ku ew heta qiyametê ji ser serê me kêm nebe. Ger em nikaribin tu tijtî bikin, ger em nikaribin bi tu rêyan bigihêjin ava heyarê, em ê bi mirovan re, bi wan

mirovên ku bihuner û biaqil re hevkariyê bikin û ev ava heyatê
li kî derê be, em ê ji Siltanê xwe re peyda bilcin.
SiJtên dengê xwe hîn jî xemgîntir kir û peyivî:
- Ax, ax gêrîkên min, ruh û canên min, hêviya xwe ji mirovan
bibirin. Di vî lcarî de, divê hûn hêviyeke herî piçûk jî
bi mirovan ve girê nedin. Bi mirovan re gelek tecrubeyên
min hene. Ev birayê min î Serokê Hudhudan, ji roja ku dinya
ava bûye û heta nuha mirovan nas dike, hem jî siltanên
mirovan nas dike. Serkumikê Berz!
- Kerem bike, Siltanê me!
Serokê Hudhudan ji ser guliyê wê dara li hember firiya û
188
hat xwe li ser guliyê li ber bêvila Silrên danî.
Siltên emir dayê:
- Ji van re behsa mirovan bike. Li gora ku ev weha dipeyivin,
ne xwe mirovan nas nakin. De bibêje!
Serokê hudhudan situyê xwe dirêj kir, qirilca xwe safî kir,
baskên xwe ji hevdu vekirin û girtin û xwe rawejikand. Wek
ku xwe ji tijtin gelekî girîng re amade dikir.
- Mirov bi gijtî du bej in. Bejek ji wan fîl in û bejê din
gêrîk in. Eyn wek vê derê, fîl hindikayî û gêrîk piraniyê pêk
tînin. Eyn wek vê derê, bejê mirovan ê fîl destê xwe di ava
sar û germ de danakin, eyn wek ên vê derê, her qûna xwe dixurînin
û nektar, gojt, navilca kulîlkan dixwin. Gêrîkên wan
dikare ji wan re, jîrê teyran jî peyda dikin. Lê ne fîlên wê derê
û ne jî siltanên wan, wek fîlên me yên vê derê û Siltanê
me çavtêr in. Binihêrin, gava hûn vê Zivistanê birçî man, fîlên
me û Siltanê me çawa di gaziya we de hatin. Mirovgêrîk

ji nêza bimirin jî mirovfîl misqalekî nade wan. Hin salan li
dinyayê mahsûl pir dibe, mirovgêrîk ji mirovfîlan re pir hildiberîne.
Ew mahsûl di embaran de hilnayên. Wê gavê, mirovfîl
çi dikin? Ma hûn dizanin, bê ew çi dilcin?
Çavên xwe li ser qelebalixiya gêrîkan a ku li meydanê duxulxulî
gerand:
- Çi dikin?
Dîsa tu bersiv wernegirt. Gêrîk çi dizanin, bê mirovfîl çi bi
mahsulan dikin!
Yekî got:
- Didin mirovgêrîkan.
Serkumikê Berz bi kerb keniya:
- Nadin wan! Mirovgêrîkên birçî li wan mahsûlan dinihêrin
û xweziya xwe dadiqurtînin. Ji nêza bi ser hevdu dimirin,
lê mirovfîl dîsa jî ji wan mahsûlan piçekî nadin mirovgêrîkan.
189
Gêrîkekî ciwan li benda sebira xwe nesekinî û pirsî:
- Le, çi dikin?
Serokê Hudhudan got:
- Dijewitinîn, dijewitînin, mahsûlên zêde dijewitînin. Li
ber çavên wan mirovgêrîkên birçî dijewtînin. Dirijînin çem
û deryayan û mirovgêrîk jî ji nêza dimirin.
Silranê Fîlan xortima xwe ber bi ezmên ve bilind lcir û bi
awayekî xwe ecibandî got:
- Dimirin!
- Siltanê me, fîlên me qet najibin wan mirovfîlan. Ew mirovfîl
li vê dinyayê, cinawirên herî xayin in. Tu tijt namîne
ku ew di mirovgêrîkan de nakin. Ji gava ku dinya ava bûye û

heta nuha, ew her zilm û tahdeya nedîtî li wan dikin.
Gêrîkekî ciwan pirsî:
- Ma mirovgêrîk weha dest û ling girêdayî radiwestin û li vê kedxwariyê, li vê jikenceyê, li vê birçîbûnê, li vê...
Siltanê Fîlan bi helûbelê îjaretek da Serokê Hudhudan.
Wî pirsa gêrîkê ciwan tavilê fahm kir, lê xwe li kerî danî.
- Siltanê me qenc e. Divê ava heyatê jê re bête peydakirin. Ew ji bo hemû fîlên dinyayê nimûne ye. Ji bo mirovfîl, gafîl, wawîkfîl, marfîl, kerfîl û hemû fîlan nimûneya qenciyê ye.
Siltanê Fîlan dest bi peyvê kir:
- Birayên min ên gêrîk, ji gava ku dinya ava bûye û heta nuha, ew mirovfîl her li ava heyatê digerin. Ew ew qas zalim, ew qas xerab, ew qas kedxwar in ku xwezayê ji ber vê yekê, ava heyarê nedaye wan. A, ji ber vê sebebê, birayên min ên gêrîk, hûn ê bi huner û aqilê xwe, ji min re ava heyatê peyda bikin.
Gêrîkên li meydanê civiyabûn ku xwe bi dar, kevir, zinar, gîha, darik û kulîlkan ve seyandibû, bi hevdu re bang Icir:
- Em ê peyda bikin!
- Hûn sax bin, her hebin! Ez ê jî îroj, bi minasebeta sedhe-
190
zarsaliya biratiya fîl û gêrîkan, heft zirembarên ku heta ber dev bi navilca kulîlk, genim û dendikan ve dagirtî bidim vekirin.
Hemû birayên min ên gêrîk dê heft roj û heft jevan bbcwin, vexwin û sedhezarsaliya biratiya me pîroz bikin. Dû re, pijtî heft rojan, grûpeke mezin a ku ji gêrîkên herî biaqil pêk tê, dê dest bi lêgerîna ava heyatê bike û heta ku ev grûp ava heyatê peyda neke jî ew ê nezîvire.

Rawestiya. Xortima xwe ya dirêj li ser gêrîkan gerand, bi dengekî ku erd û ezman hejandin, bang kir:
-Ez naxwazim bimirim! Ez naxwazim bimirim! Ez naxwazim bimirim!
Dû re, dîsa rawestiya. Xortima xwe ber bi gêrîkan ve heta ku dikarîbû dirêj kir û peyva xwe domand:
- Ger gêrîk ji min re ava heyatê peyda bikin, ez ê vê dinyayê biguherînim. Ez ê gêrîkên ku ji min re ava heyatê peyda bikin, bikim fîl û van fîlên qûngird ên bi kêrî tu tijtî nayên jî bikim gêrîk. Naaa, ger gêrîk ji min re kaniya ava heyarê peyda nekin, bila hêviya xwe ji vê dinyayê qut bikin. Ez ê van fîlên qûngird ên bi kêrî tu tijtî nayên, bijînim ser welatên gêrîkan û heta Ii vê dinyayê gêrîkek bi tenê jî nemîne, ew ê wan bieciqînin. Ez naxwazim bimirim, ez naxwazim bimirim, ez naxwazim bimirim! Ma siltanekî fîlan dê çawa bimire? Ez mirinê layiqî xwe nabînim. Tu kes ji mirinê bawer nake, ez jî bawer nakim. Mirin, hey ya ku ji ezmanan bilindtir, ez nikarim tehamulî te bikim. Ez naxwazim bimirim. Ji ber vê sebebê, hûn ê ji min re kaniya ava heyatê peyda bilcin.
Meydan bi dengê gêrîkan hejiya:
- Em ê peyda bikin!
- Wê gavê, heydê ziyafetê.
Siltên ji ber pijta xwe, heft kilîdên zirecêb derxistin û ew dan fîlê embarvan.
- Herheft embaran jî a nuha veke.
191
Gêrîkan bi hevdu re ji meydanê berê xwe bi kêf da embaran. Kêf û jahiyê dest pê kir. Gêrîkan dbcwar, vedixwar û dîlan

dikir. Dîlanên wan ew dîlanên ku li kêf û jahiyên gêrîkan
ên kevin dihat kirin, bûn.
Pijtî heft rojan, kêf û jahî qediya.
Siltên bangî Serkumikê Berz kir û got:
- Serokê Hudhudan, birayê min î berêz, dilê min li van
xera dibe. Min çi xwest, ew li hember derneketin û ji hemuyan
re got, erê. Ez ji vê helwêstê bi guman im. Ji tijtê nabe re
jî dibêjin ku dibe.
Serkumikê Berz pirsî:
- Le, te çi hêvî ji wan dikir, Siltanê min?
Siltên got:
- Qet nebe, bila li dijî xwestineke min derketibana...
- Siltanê min, wan nikarîbû.
-Jiboçi?
- Ji ber ku hat fahmkirin ku ê wan asasê ser berfê bû.
Serkumikê Berz hemû tijtên ku li çiyayî qewimîbûn, bê
rîhsor çawa ketibûn xefika zeriyên ku rîhên sor bi xwe vekiribûn
û bi hevdu ketibûn û hevdu kujtibûn, anî bîra Siltên.
Siltan keniya û zikê wî yê mezin janzdeh caran rabû û daket.
- Hat bîra min, hat bîra min, Ew roj tê bîra min, pir pir
baj tê bîra min. Ne xwe, li wê derê tu rîhsor nema?
Serkumikê Berz got:
- Ger mabe jî qet guh nedê. Rîhsor ji nuha û pê ve, êdî îfleh
nabin. Me fesadiyeke weha xist nav wan ku ew heta aqiyametê,
nema dikarin pijta xwe rast bikin...
- Ew roj tê bîra min, tê bîra min. Ew roj çi rojeke xwej
bû. Çixwej...
- Siltanê min, ez pir keniyabûm.

- Ew roj rê bîra min, gava gêrîkan hevdu dikuştin, ez ji kê-
192
fa dikeniyam.
- Siltanê min, gava gêrîkên gernas hevdu bi awayekî zalim dikujtin, çiya, kevir, derya, zinar, ezman û daristan jî bi te re keniyabûn.
- Zeriyên min, egîdên min! Mbcabin ku wan nemerdan zeriyên min kujtin... Rîhên wan sor boyax kirin, ew kujtin û termên wan anîn avêtin ber deriyê seraya min. Wan digot qey ez bi vê fena wan, bi vê rezîltiya wan nizanim.
- Siltanê min, hîn jî weha dizanin. Ew hîn jî weha bawer dikin ku me digot qey ew gêrîkên mirî rîhsor in.
- Birayê min î Serkumikê Berz, gidî bila weha bawer bikin! Bila nizanibin ku em bi fena wan hisiyane... Ger bizanibin ku me ji bê çaretiyê, xwe li hember cinayetên wan, li kerî daniye... Zeriyên min jî heyfa mc a ya xwe ji rîhsoran bi zêdeyî hilanî. Hilanî ha, hilanî ha...
Serkumikê Berz jî bejdarî vê kêfa wî bû:
- Hilanî, hilanî, hilanî ha!
Hudhud li ser guliyên daran, bi kêf kir bûte bût û bejdarî vê kêf û heyecana Siltên û Serkumikê Berz bûn. Fîlan jî qûnên xwe sed carî di daran de dan û mest bûn.
- Hilanî ha... Siltanê min î muhtejem, ji ber vê yekê, em ê gêrîkên fenek ceza nekin.
Silrên kêf û heyacana xwe domand:
- Em wan ceza nakin!
Serkumikê Berz got:
- Em ê karên pir giran bidin ser milên wan. Em ê karên

ew qas giran bidin ser milên wan ku piçek wexta wan a filcirandinê jî dê nemîne. Em ê tu carî nehêlin ku ew firseta serên xwe brxurînin jî peyda bikin. Ew ê hertim di kar de bin, hertim birçî bin, hertim xizan bin û di tirsa pêjerojê de bin. Ev tirs dê wan kor, ker û gêj bike û mejiyên wan rawestîne. Mirovfîl li mirovgêrîkan hertim weha dikin.

193

Siltanê Fîlan jaj ma.

- Wey lawo! Ez qet li vêya nefikirîbûm. Ne xwe, ev mirovfîl pir bi aqil in.

Li Mirovistanê, gelek serî ji bo wan, ji bo wan mirovfîJan dixebitin. Ew, mirovgêrîkên ku piçekî difikirin jî wek xwe dikin fîl.

Siltên kêfa xwe anî û got:

- Em jî weha bikin. Nuha, tu ji min re kar peyda bike, kar... Divê em ew qas kar bidin ber wan, biJa ew ne fikirandin, nikaribin bêhna xwe jî bistînin. Eyn wek mirovgêrîkên Mirovistanê.

- Siltanê min, ma ji kar bêtir çi heye? Ez ê ji gêrîkan re ew qas pir kar peyda bikim ku ger îroj dest bi yekê bikin, nilcarin di panzdeh salan de biqedînin.

- Bibêje, bibêje, zû ji min re bibêje û pijtî wê jî here emirê min bigîhîne gêrîkan.

- Ji her fîlekî re serayek.

- Pir baj e. A nuha, emirê min bigihîne gêrîkan. Bila ew ji her fîlelcî re serayekê ava bikin. Ew qas pir û ew qas jêhatî ne ku dikarin ji her fîlekî re, ne serayekê, sê serayan jî ava bikin.

- Siltanê min, hîn heye, hîn heye. Ew ê embarên li aliyê

çiyayî din jî ji bo hudhudên min bi mêj û kêzikan ve dagirin.
- Tavile biçe û emirê min bigihîne gêrîkan.
- Siltanê min, hîn jî heye. Bila li ser qorê wî çiyayê bilind ê li hember, heykelekî te çêbikin ku bi qasî wî çiyayî bilind û bi heybet be. Li gora ku tu ê qet nemire, gor ne pêwîst e. Serê heykelî dê ezmên qul bike û bigihêje sitêrkan. Ji bo her hudhudekî jî hêlînek û embareke kulî... Em hudhud hem ji kuliyan û hem jî ji heykelê Siltanê xwe gelekî hez dikin...
- Tu ê nuha bi lez bifire û emirê min bigihîne gêrîkan.
Gava emirê min gîhajt gêrîkan jî ew ê tavUê dest bi kar bi-
194
kin. Divê çavên xwe ji kar venekin û serên xwe ranekin. De bifire, biçe wê derê, li tu deveran neawiqe û vegere.
Serkumikê Berz bi sî û sê hudhudan firiya, çû welarên gêrîkan.
Emirê Siltên gîhand seranserî hemû welatên gêrîkan.
Serokê Hudhudan di demeke kurt de vegeriya serayê.
- Zû bibêje, reaksiyona wan çi bû?
- Wan got ku emirê Siltanê me li ser serê me û taviJê dest bi lcar kirin. Gava ez vegeriyam vira, ez di ser wan re firiyam, ji rojhilat heta rojava, li ser rêyan, li hêsaran, li dejt û zozanan hem jî di orta dinyayê de, gêrîk bi dû hevdu rêz bûbûn.
Ji bo ku bigihêjin orta dinyayê û almasa pembe, dîsa erd dikolan.
- Le, ava heyatê?
- Ji bo ku li ava heyatê bigerin, gêrîkên herî neqane, herî bilez û zane jî bi gêrîkên siwarî re jandibûn çar aliyên dinya û kaînatê.
- Ne xwe, hemû serîhildan, îdîaya fîlbûn û qûnxurandinê, daxwazên di warê navika kulîlkan de, ji bin serê Hesinkerê

Kulek derdiketin. Ma xeber rast e, derew e? Ma Hesinkerê Kulek miriye? Baweriya min pir pê nayê.
- Dibêjin ku Serokê gêrîkên zerî ew kujtiye û gêrîkên zerî nuha ji wî re dibêjin, Serok.
- Ger Serokê gêrîkên zerî ew kujtibe, ger serê wî Hesinkerê Kulek ji min re bîne, ez ê jî seroktiya hudhudan jî û ya fîlan jî bidim wî.
- Siltanê min, Serokê hudhudan ez im...
- Ez ê jî seroktiya bet, jirkak, sîsark, serxwînk, bajoke û serçeyan bidim wî. Seroktiya kîjan çivîkî bixwaze... Ez ê heta dawiya emirê wî jî bi qasî ku ew bbcwaze bi embaran xwarinê bidim wî. Ez ê bi ser de jî serayekê ji Serokî re çêbikim... Ez ê heykelê wî jî çêbikim.
- Siltanê min, wî ew Hesinkerê Kulek kujtiye. Ez ê xeberê
195
jê re bijînim, bila serê Hesinkero bîne û bê.
- Tu bi lez biçe wê derê, bîne û were...
- Çûna min a wira ne rast e. Ez ê gêrîkekî rîhsexte bijînim wê derê. Serokê gêrîkên zerî sûnd xwariye û gotiye ku heta li vê derê, rîhsorek bi tenê jî nemîne, ez ê jer bidomînim.
Siltên got:
- Gidî, bila bidomîne. Ez naxwazim, bila neyê. Bila rîhsorek bi tenê jî nemîne. Tu wî gêrîkê rîhsexte li ser baskê hudhudekî bike, bila wî bibe wê derê. Ji wî re bibêje, bila ji Serokê gêrîkên zerî re bibêje ku heta ew wê kûra fesadiyê netefîne, bila neyê. Nuha, li min guhdarî bike, Xwedê bike ku Hesinker miribe, ger nemiribe, divê bête kujtin. Dîsa jî ez ditirsim ku ev gêrîk dê tijtinan bikin. Rojekê, dê bê bîra wan

ku ew gêrîk in. A, wê gavê jî ew ê ji bo ji me xelas bibin, li rêyan bigerin û ew ê bibînin jî... Ew, ew qas qelebalix û ew qas pir in ku... Ji ber vê yekê, divê em realîst bin. Ew ê bivê nevê rojekê bê bîra wan ku ew gêrîk in.
- Siltanê min, ew gêrîktiya xwe qet ji bîr nakin. Yên ku ji bîr dilcin jî pir in, lê piraniya wan ji bîr nakin. Ew xwe weha didin xuyakirin. Hayê wan ji gêrîktiya wan ew qas heye ku! Wê bangkirina wan a ku dibêjin, em fîl in, em fîl in ne rast e. Xwe dixapînînin... Heta ku wan dizanîbû Hesinkerê Kulek sax e, hêviya wan hebû. Hem hertijt qebûl dikirin û hem jî serî hildidan. Niha, bê hêvî ne.
- Bêhêvîbûna wan baj e. Divê karê me yê yekem ev be ku em hêviya wan bijikenînin. Roja ku hêviya wan bi temamî nema, gêrîktiya wan jî dê nemîne. Ew ê bibêjin qey, ew mexlûqin ku bi armanca ji fîlan re bixebitin, hatine afirandin. Mirovfîl li mirovgêrîkan tam weha dikin, hêviya ku di dilên wan de heye dijikîne.
- Ev baj e. Ne xwe, ez baj fikirîme. Divê em ji bo vêya çi
196
bilcin?
- Em ê dibistanên ku gêrîkan dikin fîl vekin. Gava çêlikên gêrîkan hîn nuh çêdibin, em ê wan bînin li van dibistanan perwerde bikin. Ew gêrîk bin jî ew ê xwe fîl bihesibînin û ew ê ji fîlan bêtir bi fîlîtiyê ve bên girêdan. Bi sedan salan e ku li Mirovistanê, ev sîstema perwerdekirinê tê mejandin. Ew ê bibin fîl û xwe fîl bihesibînin, lê ew ê qet ji bîr nelcin ku ew fîlên bi qasî gêrîkan in.
Siltanê Fîlan got:

- Ji min re gelek gêrîkên weha lazim in. Serokê Hudhudan,
tu wekî din çi difikirî?
- Siltanê min, wekî din jî em ê li ser her girekî, li her derê
û li her bajarelcî gêrîkan bi sedan borîzanan deynin. Ew borîzan
dê hergav, bêyî ku navbirê bidinê, bêyî ku aciz bibin û
bê rawestan bibêjin ku fîl mezin in, ev sîstem nayê guhertin,
ger bê guhertin hemû dinya dê hilweje, li ser ruyê erdê û kaînatê
tu benderuh namîne, di esilê xwe de, gêrîk fîl in, lê bi
qasî gêrîkan fîl in.
- Zû, çi qas borîzan pêwîst bin, ew qasî ji mirovan bide kirîn.
- Min ew dan kirîn, Siltanê min.
-Ji kîderê ûçawa?
- Siltanê min, borîzan îcadên kevin in, li ba her qewmî hene.
Ji ber vê sebebê, min hudhudên xwe li dinyayê helav lcirin,
li ku çi qas borîzan peyda kiribin, kirîn û hatin.
- Baj e, baj e. Karê me baj dimeje, birayê min î Serkumikê
Berz. Pijtî ku ev gêrîk hebûn, ji bo çi em weha ehmeq ehmeq
ew qas sal di feqîriyê de jiyane!
- Siltanê min, weha çêbû, em çawa bikin, em ji nuha û pê
ve, lê miqate bin.
- Ez bawer nakim ku ev gêrîk dê bi wan lajên xwe yên piçûçik,
bi qasî ku li hember me serî hildin, ehmeq bibin. Ger
197
gêrîkek çav li fîlekî bikeve, ziravî wî dê biqete.
- Siltanê min, lê ji nav wan ên rîhsor jî derdikevin.
- Ma yên ku reviyan û çûn wê derê, hîn hene?
- Siltanê min, tu tijtekî min ê ku ez ji te vejêrim tune ye.
Ew kom bi kom direviyan û diçûn ba Hesinkerê KuJek û tevî

wan dibûn. Nuha, pijtî hat bihîstin ku Hesinkerê Kulek miriye, ew bûn wek berxikan.
- Borîzan dê hêviya wan pir bijkîne. Ew ê her bibêjin ku Xwedê û xwezayê ev sîstem weha ava kiriye, fîl fîl û gêrîk jî gêrîk hatine xuliqandin. Ev ê qet tu carî neyê guhertin. Gêrîk ancax bixebitin, cehd bikin û têkevin çavên fîlan, dikarin bibin fîl. Ew jî ancax fîlên bi qasî gêrîkan... Borîzan dê awaz û sitranên xwej ên ku mirovan di xew re dibin bibêjin. Saz dê meqamên xewrebir, hêvîjikên û rejbînkir lê bbdn. Ew ê gêrîkan birizînin.
- Siltanê min, em di hundurê çend rojan de, dest bi borîzanan dikin... Ez dibistanê jî sibehê vedikim. Min ji zû de haziriya wê kiribû. Gef dijminên me gêrîk bin jî divê em wan piçûk nebînin.
Li hemû welarên gêrîkan û li hemû deverên ku gêrîk lê dixebitîn, borîzan hatin danîn. 0 borîzanan dest pê kir û rojê bîst û çar saetan lê xist. Berê, ew qas peyv û saz bi gêrîkan pir ecêb hatin, lê dû re, fêrî wan bûn. Hertijt ji bîr kirin û hogirî borîzanan bûn. Gava ku borîzan, bîstikekê an jî rojekê radiwestiyan, gêrîk dîn dibûn. Ew qas hogirî borîzanan bûbûn ku borîzan bûbûn perçeyekî wan. Ji ber tu tijtî, nema serîhildan çêdibû, lê ger Siltên rojekê dengê van borîzanan bibiriya, ew ê wê gavê qiyamet rabûya. Bi hatina borîzanan re, bi gêrîkan re guhertinin berbiçav xuya dibûn. Serkumikê Berz, hudhud û gêrîkên ku xwe fîl dihesibandin, tijrên ku li welarên gêrîkan çêdibûn, bi hemû detayan herroj digîhandin Sil-
198
rên. Komîteya ku Siltên ava kiribû, li ser hemû tijtên ku diqewimin

baj radiwestiya, bi baldariyeke mezin li hemû detayan hûr dibû û dinirxandin.
Pijtî borîzanan, hejmara ew ên ku dibûn rîhsor û direviyan welatê çiyayan, pir pir hindik bûbû. Hela, bila gêrîkên li dibistanê ên ku dê bibin fîl li welatan belav bibin, wê gavê, gêrîk dê tu carî nema bikaribin pijta xwe rast bikin û gêrîktiya xwe bi bîr bînin. Komîteya Zanistî ya ku Siltên ava kiribû, bi baldariyeke mezin û bi hûrbijarî li ser gêrîkan û rîhsoran dixebitî.
Siltanê Fîlan bi gêrîkên xwe yên ku jê re ev seray û ev text çêkirin û ew qas xwarin kijandin, pir bawer bû. Wan ê ji Siltanê xwe re ava heyarê jî peyda bilcira.
Bi rastî jî hîn gelek wext derbas nebûbû, gêrîkan mekîneyên qûnxurandinê peyda kirin û ji bo Siltanê xwe anîn.
Hem jî ne pênc, ne deh, bi hezaran... Wan mirov bi cîncoq mincoqan xapandibûn û ev mekîneyên gelekî hêja stendibûn û ji Siltanê xwe re anîbûn. Ji bo van mekîneyan, kêfa Siltên ecêb hat. Gêrîkên ku ev mekîneyên qûnxurandinê peyda kiribûn, helbet dê ava heyatê jî peyda bikira. SUtên mekîneya herî xwejik ji xwe re veqetand û xist qûna xwe. Mekîne di qûna wî de, çû û hat û xurand. SUtan mest bû.
Wey lawo, ev mirovên Mirovistanê çi qas pêj de çûbûn! Û li vê kaînarê, di ser mirovfîlan re, tu mexlûq tune bû. Li heyvê û li sitêrkan jî tune bû. Nesilê ku mekîneyeke qûnxurandinê ya weha çêkir, nikarîbû çi çêbikira... Na na, gêrîkên mirov ev mekîne ji wan re çêkirine. Ew ê çawa çênekin? Ji hezar salan û vir de ye ku mirovfîlan metoda xebitandina mirovgêrîkan peyda kiribû, lê ya rastî, ji bo fîlên fîl hîn divê. Ev gêrîkên

gêrîk bi qasî mirovgêrîkan ne sernerm bûn jî. Tavilê bûbûn
rîhsor bera dû wî Hesinkerê Kulek dabû, çûbûn wê derê,
wî çiyayî û serî hildabû. Xwedê riya bavê me sitirand ku
199
Serokê Hudhudan ji mirovan fêrî pir tijtan bûbû û bi kêrî
me dihat.
Siltên mekîneyeke qûnxurandinê, li wê derê, tavUê da Serkumikê
Berz. Serkumikê Berz ew qasî kêf kir ku, hema mekîne
wê gavê xist qûna xwe û xebitand.
- Siltanê min, êdî pijtî vê mekîneyê jî ger ez nebim fîl...
Siltên serî lê mezin kir:
- Birayê min, tu hertim fîl bû, hem jî fîlêkî biaqil ku dikare
bifire.
Serkumikê Berz jî ji ber van gotinan mest bû, ji kêfan ji çavên
wî hêsir hatin.
- Ev mekîne jî ya Serokê gêrîkên zerî ye... Kengî hat vê derê,
bila mekîneya xwe werbigire. Vê mekîneyê li devera serayê
ya herî muhtejem deynin. Serokê hudhudan hesûdî ji Serokê
gêrîkên zerî kir, lê neda xuyakirin.
- Em ji van mekîneyan bi qasî ku pêwîst e, hîbeyî dibistana
ku gêrîkan dike fîl jî bikin.
- Em hîbeyî wan bikin, Siltanê min.
- Em çend heban bidin serlejkerê fîlên me jî.
- Em bidinê, Siltanê min.
- Ger ev Hesinker nemiribe, mirov mekîneyeke qûnxurandinê
ji wî re jî bijanda, bi vî awayî, ew bûbûya tiryakiyê
qûnxurandinê, mest bûbûya û ji xwe biçûya û bUiata têketa
bin emirê min, ma nabe?

Serkumikê Berz got:
- Bellcî. Kî dizane, dibe ku rêketa bin emirê te, lê ew ji zû de miriye. Tijtên weha li ba mirovgêrîkan hatine dîtin, gelek serokên mirovgêrîkan ketine bin emirê mirovfîlan. Siltanê min, ma Hesinkerê Kulek dê ji bo çi nekeve bin emirê Siltanekî wek te mezin? Lê ez dizanim, Serokê gêrîkên me yên zerî ew kujtiye. Ev Serokê gêrîkên zerî yeman derket, pir kone û organîzetorekî ecêb derket.
200
Gava ku Serolcê gêrîkê zerî wan ji ortê rake û bê ba min, ez ê wî bikim endamê Komîteya Zanistiyê jî û yê fîlan jî... SUtan tavilê tê gîhijt ku ev gotin bi Serokê Hudhudan ne xwej in û ew dixsiyan ji Serokê gêrîkên zerî dike, wê gavê peyva xwe di wira de qut kir.
- Li vê Fîlistanê tu çi bixwazî, ew ê bibe. Li FUistanê yê herî zane tu yî. Ez bi saya serê te gîhajtim vê bextiyariyê. Ji ber vê sedemê, tu ronahiya çavên min î. Zaneyê zaneyan birayê min î Serkumikê Berz, bila tu vêya jî weha bizanibî.
Serkumikê Berz ji ber kêfa xwe lerizî û got:
- Siltanê min, tu her hebî!
0 mekîneya qûnxurandina di qûna wî de, her dixebitî.
Mest bûbû. Serkumikê Berz dewam kir:
- Siltanê min, bi saya vê mekîneyê, êdî li qûna min dê perîk jî jîn bibin, ne weha?
Silrên got:
- Ew ê jîn bibin. Ev mirovfîl jî mexJûqin yeman in, min dbcwest ku Siltanê wan dostê min bûya. Ez wî gelekî meraq dikim.

Serkumikê Berz got:
- Ew jî wek mirovfîlên din e. Eyn wek wan... Ferqa wan û ya mirovfîlên din, bi tenê taca wî û kubra wî ye. Serokê mirovfîlan piçelcî jî ehmeq e.
Siltanê Fîlan jaj ma û got:
- Waaa! Ne xwe, ev ne wek ferqa ku di navbera me û gêrîkan de ye, ne weha?
Serkumikê Berz got:
- Na, na! Siltanê mirovfîlan eyn wek mirovfîlên din e. Mirovfîl jî û mirovgêrîk jî xwediyê du çavan, du lingan û du destan in. Di navbera wan de û di xuliqandina wan de, tu ferq tune ye.
- Ecêb...
20I
Serkumikê Berz got:
Belêêê, ecêb e. Bi ser de jî gêrîkên Mirovistanê wek berxikan in... Rîhsorên Mirovistanê ji rîhsorên me hezar carî xerabrir in. Gêrîkekî zerî bi tenê, dikare malUcê li wan xera bike û wan çil salî bera ber hevdu bide.
-Ecêb!
Serokê Hudhudan got:
- Belêêê, pir ecêb e.
Di demeke kurt de, dibistanên ku gêrîkan dikin fîl hatin vekirin û dest bi perwerdekirinê hat kirin. Dibistanan di demeke kurt de, encam dan. Ev nesilê gêrîkan jî çi qas pir dixwestin bibin fîl! Gêrîkên ku diçûn dibistanê, ne pir, lê di hundurê çend mehan de, dibûn fîlên eyn wek fîlan. Wek fîlan radibûn û rûdinijtin, wek fîlan dbcwar û vedixwar, wek

fîlan hereket dikir, qûnên xwe wek fîlan, bi nazdarî di daran de didan û eyn wek fîlan dipeyivîn. Tu nema bû ku her yelcî ji wan dê xortimeke fîlan bi lajê xwe yê piçûçik velcira û di Fîlistanê de weha bigeriyana. Lê ew ne dijibiyan wan gêrîkên pir rûstendî û wan tu carî ji bîr nedikirin ku ew bi qasî gêrîkan fîl in. Rojek dê bê ku ew ê bibin bi qasî fîlan û fîlên wek fîlan. Ew li benda wê rojê bûn. Ger ew nebûna fîlên bi qasî fîlan jî ne girîng bû, belkî jî fîlbûna bi qasî gêrîkan, ji fîlbûna bi qasî fîlan hîn çêtir bû. Hem berpirsiyarî û giraniya fîlbûna bi qasî fîlan, dê ne li ser milên te bin û hem jî tu ê wek fîlan, heta ji fîlan jî bajtir bijî. Ev gêrîkên xwendevan weha bi çavekî piçûk li gêrîkên din, li dê û bavên xwe û li hevwelatiyên xwe dinihêrîn ku Siltanê Fîlan jî li ba wan, pir nefispiçûk dihat xuyakirin. Her gêrîkekî ji van gêrîkên piçûçUc, ji nuha de bûbû fîlekî ecêb ku bi qasî serê derziyê piçûçik... Wan bi her awayî, xwe ew qasî zû guhertibû ku... Di demeke nêzîk de, ev gêrîkên fîl dê dibistana xwe biqedanda û li ser navê Silta-

202

nê Fîlan birêvebirina gêrîkan têxista destên xwe. Siltên dê birêvebirên kevin, ji ser kar biqewirandana, lê SUrên nUcarîbû ev birêvebirên kevin ên ku di hemû jiyana xwe de bi wî ve girêdayî mabûn, bidana aliyekî. Wî dê di seraya xwe de, kar bida wan û ew bikirana jêwirdarên xwe. Wî dê bi vî awayî gelek kesên bi hêz, hîn bêtir bi xwe ve girê bidana û hîn beriya ku xayinên rîhsor ji diya xwe bikevin, wî dê ew li çiyayên wan bixeniqandana. Hela, bila ev dibistan dest pê bikin û gêrîkên fîl derxîne, jê û pê ve Xwedê mezin e.

Borîzanan jî dest pê kiribû. Gêrîk di xew de bûna jî biçûna

kî derê jî dengê borîzanan her di guhên wan de bû.
Her gava ku borîzanan dest pê dikir, digot ku ev sîstem
nayê guhertin. Ev dinya nayê guhertin. Ev gêrîk û ev fîl nayên
guhertin. Wan di pîyesên xwe de, di helbestên xwe de,
di sitranên xwe de, di roman û çîrokên xwe de, her ev tijt digotin.
Gêrîk gurê gêrîkan e. Ev dinya dinyaya derewîn e, dawiya
wê tunebûn e. Wan digot ku ev dinya, ev dinyaya xerab,
nemerd û qirêj ne hêjayî jiyanê ye. Hewildanên ji bo
guhertina vê dinyayê, ji ehmeqtiyê jî wêdetir, hewUdaneke
vala ye. Ma li vê dinyaya derewîn a ku tu tijt tê de nayê guhertin,
hewildana ji bo guhertina wê, ne ehmeqtî ye, le çi ye?
Tu gêrîk nikare li vê dinyayê bextiyar be. Ma qey fîl tevî wê
lajgirsiya xwe jî bextiyar in? Siltanê Fîlan bi xwe jî ne bextiyar
e. Helwêsta ku dê gêrîkan bextiyar bike ew e ku divê gêrîk
ji bo Siltanê Fîlan bi canfedayî bixebitin, bixebitin û dîsa
bixebitin û ji bo Fîlistanê, canê xwe fedayî birayên xwe yên
gêrîk bikin. Wan ji tijrên ku gêrîkan ji bo fîlan û Siltên dilcirin,
bê rawestan her nimûne didan. Belê, gêrîk dê bûbûna fîl
jî, ji xwe ew fîlên lahnetlêhatî bûn. Her gêrîk ji berê de fîlek
bû, lê lahnet li wan hatiye û weha wek gêrîkan hatine piçûkkirin.
Her gêrîk bi xebarê û bi destûra Silrên dikare bibe fîlek.
Belê bi destûra Siltên... Siltan dikare fîlîtiyê bide her gê-
203
rîkê jêhatî. Gêrîk dikarin bi destûra Siltên bibin fîl. L£ ew
dikarin bi tenê bi qasî gêrîkan bibin fîl.
Û zîngîniya borîzanan bi jev û bi roj, sibe û êvarî bê rawestan
dihat. Dengê borîzanan ji erd û ezmên dihat. Ji dar, av û
deryayan dihat. Bi co û cobaran û bê dihat. Ji sitêrk, heyv û

rojê bi tîrêjan dihat.
Ji aliyekî ve ji ber kar, ji aliyekî ve ji ber borîzanan û ji aliyê din ve jî ji ber birêvebirên gêrîkfîl ên nuh ku ji dibistana fîlan bûbûn fîl û derketibûn û fîlî bi qasî zimanê bav û Icalan fêr bûbûn, gêrîkan êdî ne tu tijt diditin, ne difikirîn û ne jî dibihîstin. Edî nema wek ên berê, sexte û teqlîd, her gêrîk nuha xwe fîlekî piçûçik dihesibîne. Bi serbilindahiya fîlbûnê mest dibin, lê wek fîlên bi qasî gêrîkan... Wan fîlbûn û jerefa fîlbûnê di kûrahiya dilên xwe de his dikirin û ji bo SUtên, ji bo fîlên mezin û bê hempa û heta ji bo hudhudên ku li ezmên difiriyan jî bi fîlîtiya wek gêrîkan, bê rawestan dixebitîn.
Êdî, ew ne gêrîk û ne jî fîl bûn, heryek ji wan bûbû melcîneya ku xwe fedayî Fîlistanê kiribû.
Borîzan û dibistanên ku gêrîkan dikin fîl ji hêviya ku Siltên ji wan dikir bêtir bi kêr hatibûn. SUrên borîzanên hîn cudatir, rojname, sînema, radyo û televîzyon jî bi gêrîkan dan îcadkirin... Gêrîkan piraniya van îcadan ji Mirovistanê didizîn, lê Siltên xwe li nezaniyê danîbû û her îcadek bi hezar carî li giraniya yê mucîd bi xelat dikir. Tesîra van îcadên nuh, hîn jî bêtir bû. Êdî, qet tu gêrîk nikarîbû ji derveyî van, li tu gotineke din bifikiriya.
Televîzyon, radyo, sînema û borîzan sibehekê bi hevdu re dibêje:
- Dinya tune ye, kaînat tune ye, bi tenê Siltan heye û fîl hene.
Gêrîkan jî ev gotin wek ku gotinên pîroz bûn, bê rawestan her dubare dikirin:
204

- Dinya tune ye, kaînat tune ye, bi tenê Siltan heye, fîl û hudhud hene.
Hemû gêrîk di hin rojan de jî tevî televîzyon, radyo, sînema, helbest û romanan dest bi reqisê dikir:
- Seraya Siltanê me çi qas muhtejem e... Rojnameyên gêrîkan bi jiyana mistehcen a Silrên û ya ên ku di dibistana fîlan de gîhajtibûn rutbeya fîlbûnê û bûbûn fîl tije dibûn. Dilê mirovî dibijiya jiyana wan a ku dijibiya jiyana padîjahên periyan. Gêrîkan bi ser vê jiyana ku mirovî nikarîbû bi dest bixista, can didan. Gêrîkan ev rojname ji destên hevdu direvandin û her ku di derheqê jiyana wan de dixwendin, xwe dixist jûna wan û diketin xeyala fîlbûnê.
Kêfa Siltên, fîl û hudhudan ji van tijtên ku dibûn re pir dihat û ji ber wê mest dibûn. Van îcadên nuh, êdî gêrîktiya gêrîkan bi wan baj dabû jibîrkirin. Tu gêrîkî rojên ku gêrîk bû, qet bi bîr nedianî jî. Mejiyên wan hatibû paqijkirin, vit î vala bûbû. Borîzan, radyo, sînema, televîzyon û rojname ew rojê dbcistin qalibekî. Gêrîkan bi gêrîktiya xwe re sitran, helbest, destan, merj, xanî, seray û urf û adetên ku ji bav û kalan mabûn jî ji bîr kiribûn. Ya herî ecêb ew bû ku tu gêrîkî nema dikarîbû tu tijt biafiranda. Van îcadên nuh heta dereceyekê, xusûsiyetên gêrîkan ên afirandinê, ji destên wan derxistibûn. Nuha, êdî her gêrîkek bûbû mekîneyeke ku ji Siltanê Fîlan re li ava heyatê, navika kulîlkan û jikU jikil xwarinan digere, ji wî re serayan ava dike û textan çêdike. Lê mekîneya ku qet tu carî nedifikirî...
Radyo, rojname, televîzyon û sînemayan her ku diçû ji adetê derdixist û rojê bîst û çar saetan, bê rawestan bang dikir:

- Ji bo azadî, wekhevî û biratiyê!
Li vê dinyayê hertijt ji bo azadiya gêrîkan bûn. Ew, gêrîkên
wekhev û serbixwe bûn. 0 zikê gêrîkan têr û kincên
205
wan qalind bûn. 0 ji ber ku televîzyon, radyo, rojname û sînemayan
digot, gêrîkan jî bawer dikir ku zikê wan têr û kincên
wan qalind in. Feqîrên gêrîkan weha bawer dikir ku ew
bextiyar in jî. Van îcadan hijên wan ji serên wan biribûn...
Televîzyonan rojekê digot ku jer baj e, wê gavê hemû gêrîkan
bawerî bi bajiya jer dianî û her gêrîkekî xwe Xwedayê
jer dihesiband. Roja din, ji ber ku Siltan ji nijka ve bi awayekî
din fikirîbû, radyo û televîzyonan digot ku jer xerab e,
yên din û gêrîk bi derbekê re dibûn dijminên jer û ger wan
Xwedayê jer bi dest bixista, wan ê ew perçe perçe bikira.
Çi gava ku Siltên bbcwesta, dikarîbû bi gêrîkan weha bida
gotin:
- Em mirov in, marê boayê nin, tîmseh in, qertel in, ma
gêrîk qet dikarin bibin qertel, em hesp in, rêvî nin, masî nin,
ma gêrîk qet dikarin bibin masî, em balîna, kerkedan in, zurafa
nin, ma gêrîk qet dikarin bibin zurafa, em balafir in,
trên in, kejtî nin, ma gêrîk qet dikarin bibin kejtî?
Dîsa Zivistan hat. Berî ku Zivistan bê, gêrîkan ji Silrên re serayeke
krîstal ya nuh ku ji seraya berê jî muhtejemtir ava kiribû.
Wê ji rojê re digot ku êdî tu hilneyê, ez heme. Gêrîkan
ji almasên ku ji binê erdê derxistibûn, textê pembe jî çêkiribû.
Kêfa Silrên ew qasî ji vî textî re hatibû ku wî ev textê ku
jewqeke pembe jê diçû, li qorê çiyayî danî û hefteyekê xwarin
û vexwarin ji bîr lcir û her lê temaje kir. Ji textê xwe têr

nedibû, hema wer lê dinihêrî. Gêrîkan embarên ku di bin çiyayî de bûn jî heta ber dev bi xwarinan dagirtibûn. Embar bi na'metên dinyayê yên cuda cuda heta mirov bê bes, tije bûbûn. Wan hudhud jî ji bîr nekiribûn, embarên li paj çiyayî jî ji bo wan heta ber dev tam dagirtibûn.

Tew bexçeyê Siltên, ji roja ku dinya bûye dinya û heta nuha bexçeyekî weha nehatiye dîtin. Bihujt jî ne bi qasî vî be-

206

xçeyî bû. Siltan bi bexçeyê xwe mest bûbû. Siltanekî Fîlan ê ku xwediyê bexçeyekî weha bû, nikarîbû bimira, divê nemira. Siltên ji tirsa ruhê xwe, bang kir.

- Ava min a heyatê li ku ma? Hertijrê min heye, hertijtê min. Ev dinya ya min e. Ava min a heyatê li ku ye?

Fîl, gêrîk, hudhud û mexlûqên din ên ku dengê wî bihîst, di cîhê xwe de lerizîn.

Tu kesî di wextên wî yên ku ew weha hêrs dibe de, nikarîbû xwe nêzîkî wî bikira. Serokê Hudhudan li ser serê xortima wî firiya û got:

- Lê digerin.

- Ji bo çi heta nuha peyda nekirine, li ku lê digerin?

Serkumikê Berz got:

- Li bihujtê ye. Ava heyatê ji derveyî bihujtê, li tu deverên din tune ye. Siltanê min, qûlên te yên gêrîk jî li rêya bihujtê pir geriyane û ancax nuh peyda kirine. I-ê bihujt ew qas dûr e ku... Gêrîk ji zû de ketine rêya bihujtê, lê êdî Xwedê dizane, bê ew ê kengî bigihêjin wira, kengî ava heyatê bînin û vegerin.

Siltanê Fîlan rawestiya, kêfa wî ji peydakirina avê re hat.

Cîhê ava heyatê hatibû peydakirin, pijtî hezar salan bûya jî qûlên wî yên gêrîk çi bikira dê bikira û ev av jê re bianiya.
- Birayê min î Silêmanê Dunikil, ma heta ew av bê, ez ê nemirim, ne?
- Siltanê min tu ê ji bo çi bimirî, bila dijminên me bimirin!
Siltên got:
- Kêfa min pir hat ku cîhê avê hatiye dîtin. Baj e, ji bo çi tu naçî bihujtê û ava heyatê naînî? Rêya ku ji bo gêrîkekî qonaxa çil rojî ye, tu dikarî di çavniqandinekê de bifire û bigihêjê wê derê.
207
- Siltanê min, heqê te heye, lê bi tenê gêrîk û mirî dikarin têkevin bihujtê.
- Wê gavê, ji bo çi hûn ranahêlin gêrîkan û wan nabin li ber deriyê bihujrê danînin?
- Bi tenê gêrîk dikarin hem cîhê bihujrê û hem jî deriyê wê peyda bikin, ew jî divê bi tena serê xwe bin.
Siltan ji ber van îzahatan hemuyan, pir kêf dikir. Wî dê îdare bikira, ava heyatê kengî bihata, bila bihata, ew ê nemira û li bendê bima.
Gava Zivistan hat, rê hatin girtin. Li ser ruyê erdê, xwarin jî zêde nema. Siltanê Fîlan ji Mirovistanê hîn febrîqe nedizîbûn. Nuha, tu pêwîstiya wî bi febrîqeyan jî tune bû. Ma qey wî dê hemû tijtên Mirovistanê teqlîd nekira! Gêrîk dîsa bê lcar man û destên wan di bêrîkên wan de, li cadeyên bajaran digeriyan. Nuha, wan xwarinên hindik ên ku fîlan dabûn wan, zikek têr û yek birçî bûya jî rêra wan dikir. Çi tijtekî ecêb e, rojekê ji nijka ve hat bîra wan ku ew fîl in û dîsa li

daristanê civiyan, dest pê kir û qûnên xwe di daran de dan.
Ox, êdî mirov dizane ku dinya heye, dinya heye! Rojeke fîlbûnê berberî hezar rojên gêrîkbûnê ye.
Gêrîkan bi vê tenê jî qîma xwe neanîn, bi kêfa serxwejbûn û mestbûna ji ber qûnxurandinê, heyecana wan bilind bû û dîsa wek fîlan nektar û navilca genim û kulîlkan jî xwestin.
Gava SUtanê Fîlan ev hemû bihîstin, nema dikarîbû îdare bikira pir hêrs bû û bi bêhêvîtî bang kir:
- Ev gêrîk îsleh nabin, îsleh nabin! Ji xwe, ew mirina min dbcwazin.
Serkumikê Berz bi helûbelê ket nav peyvê û got:
- Siltanê min ji bo Xwedê, Siltanê min ji bo xatirê Xwedê raweste.
Çavên Siltên dikira ji serê wî baz bida, rehên situyên wî ra-
208
bûbûn.
- Serokê Hudhudan, ma tu fahm nakî ku ev gêrîk dîn bûne...
Har bûne. Min par ji wan re negotibû ku birayên min, gêrîk gêrîk û fîl jî fîl in. Aaax, min ji bo van nankoran çi qas borîzan lê xistibûn, çi qas filîm nîjan dabûn, çi qas wejanên televîzyonê kiribûn û çi qas rojname û pirtûk jî wejandibûn.
Ev çi mexJûqên bê hij in, lo! Serê wan qet naxebite ... Ew ê nebin fîl. Binihêre birayê min î Silêmanê Dunikil, ev çi bê nan û xwê nin, ma ez bi milyaran gêrîk xwedî nakim? Ma ne ji min be, ma ger ez wan nexibitînim û xwarinê nedim wan, ew ê wek berê, dîsa hemû bi ser hevdu de ji nêza nemirin?
Ez nanê wan dibirim, ez ê binihêrim bê îcar ew ê çi gûyî bixwin.
- Siltanê min ji bo Xwedê, raweste. Ma çi dibe, wan xwestiye

piçekî bibin fîl.
Siltên bang kir:
- Nabe! Nabe! Divê mirov bi cewrî diranên wan rake. Ger ev ji nuha de fêrî qûnxurandinê bibin û navika kulîlkan bbcwazin, ew ê dû re, hem textê min, hem jî serê min bbcwazin. Ev gêrîkên nemerd çênabin, divê em hemuyan bikujin.
- Siltanê min, em nikarin wan bikujin.
- Ji bo çi em nikarin wan bikujin?
- Siltanê min, ji ber ku êdî gava ew tune bin, em ê li vê dinyayê nikaribin xwarinê peyda bikin. Em weha fêr bûn ku xwarina me hazir bê ber me û em jî bixwin. Ger ew ji ortê rabin, em ê jî ji nêza bimirin.
Siltên got:
- Ez qet li vêya nefikirîbûm. Wê gavê, ez ê wek par, xwarinê ji ser wan qut bilcim. Çi xeber ji Gêrîkê Kulek heye?
- Siltanê min, qet tu xeber tune ye. Ji gêrîkên zerî jî tu kes paj de nezîvirî. Siltanê min, em nikarin wek par, xwarinê jî ji ser wan qut bikin, divê em qut nekin.
209
- Gelo çi bi zeriyên min î egîd û jêhatî hat?
- Ev demeke dirêj e ku tu xeber ji wan tune ye. Siltanê min, ez dibêjim ku ev ne elameta xêrê ye. Ez ji meraqan dimirim, lê ez dîsa jî nikarim tu xeberan werbigirim. Gelo çi bi zeriyên min hat?
- Serokê hudhudan, min ev qet ne eciband. Heta nuha diviyabû xeberek ji wan hatibûya, ma ne weha? Ne xwe, rewja wan xerab e. Em nikarin tu ajîkariyê jî bi wan bikin, ne weha?
- Siltanê min, em nikarin tu alîkariyê bi wan bikin. Em dhê

wan nizanin. Gêrîkê Kulek xwe H devereke weha vejartiye ku ez tevî hemû hudhudên xwe bi rojan lê geriyam jî min peyda nekir.
- Serokê Hudhudan, ez ê tijtekî ji te bipirsim.
- Emir bike, Siltanê min.
- Van qûlên min ên gêrîk ji her deverên dinyayê kulîlk, tovên kulîlkan, xerz û dar anîn û ji min re li vê dinyayê bexçeyê herî xwejik çêkir, ne weha? Min çi xwest, wan her daxwaza min bi cîh anî, ne weha?
- Bi cîh anîn, Siltanê min.
- Wê gavê, ji bo çi heta nuha, ji min re ava heyatê peyda nekirine? Ew mirina min dbcwazin, ne weha?
- Siltanê min, mirina te nayê bîra mexlûqên ew qas piçûçik. Ew ê ji te re ava heyatê peyda bikin. Siltanê min, ger mirina te bê bîra wan, dibe ku ew mirina te bbcwazin. Siltanê min, tu di çavên wan de, mîna Xwedayekî nemir e.
Kêfa Siltên pir ji van gotinên Silêmanê Dunikil re hat û keniya:
- Ne xwe, mirina min qet nayê bîra wan, tîq tîîîîq!
- Nayê bîra wan, Siltanê min. Li gora wan, bê ev ezman, çiya, derya, co û cobar çawa nemir bin, fîlên pir mezin jî ew qas nemir in.
210
- Tîq tîîîîq! Wê gavê, em ê vê pirsa qûnxurandinê çawa bikin? Ne xwe, nakeve serê wan ku ez dikarim bimirim, ha...
Baj e, baş e, pir baj e. Ger Hesinkerê Kulek jî sax be, ew ê jî bawer neke ku ez dikarim bimirim, ne weha? Rîhsorên din jî ne weha?

- Weha ye, Siltanê min.
- Çi baj e! Gêrîk, çivîk, kêzik dibêjin qey ez namirim, qet namirim, ha, ne weha?
- Weha ye, Siltanê min. Nuha pêjniyareke min ji te re heye-
- Serokê hudhudan, birayê min î egîd, mêrxas û biaqil bibêje, ger ne ji te be, min ê li vê dinyayê, bi tena serê xwe çi bikira, bibêje!
- Siltanê min, divê em dest gêrîkan nedin. Baj e ku ew xwe fîl dihesibînin wek fîlan tev digerin, fîlan teqlîd dikin... Gêrîk mexlûqekî fermanjikên e. Gava ku gêrîk teqlîda fîlan dikin, dide xuyakirin ku wan hemû xusûsiyetên xwe wenda kirine. Ev nîjana bêtaqetiya wan û nemana dil û ruhên wan e... Kêfa min pir tê û ez pir bextiyar im ku ew ketine vê rewjê. Gava ku ew tevî hertijtî, li hember te jî radibin û xwe fîl dihesibînin, didin îsbatkirin ku ew ê gêrîktiya wan careke din neyê bîra wan û ew ê heta qiyametê jî wek evdên te bijîn. Ma hemû tijtê ku me dbcwest, ne ev bû? Ma ji bo vê, me ew fêrî fîlî nekirin? Ma ji bo ku ew xwe, esilê xwe û gêrîktiya xwe ji bîr bikin, me borîzan dananîn ser çiyayan, daran, rê û hêsaran? Ma me ji bo vêya, televîzyon, radyo, rojname, roman û sînema ji mirovan nestendin? Ji bo ku rojên kevin ên ku ew gêrîk bûn, neyên bîra wan, ma me ew li icarên giran rast nelcirin? Va ye, gêrîk ji tijtê ku me dixwest jî bileztir, hem jî ne fîlên wek fîlan, bûn fîlên bi qasî gêrîkan.
Ji ber van gotinan ji kêfa, devê Siltên çû paj guhên wî. Ger nuha, mirovî bigota, ava heyatê hat, Siltên ancax ew qasî kêf
211
bikira.

- Baj e, pir baj e. Kêfa min pir hat. Daxwaza me jî ev bû.
Divê em tavilê, hemû borîzan, televîzyon, radyo û rojnameyan bixebitînin... 0 divê em bê rawestan, li ser fazîleta qûnxurandinê bipeyivin. Wê gavê, bila bi hezaran filîm li ser fazîleta qûnxurandinê bên kijandin. Her jev nîjanî gêrîkan bidin.
Bila ew hem qûna xwe bixurînin û hem jî li filîman binihêrin.
- SUtanê min, ji bo gêrîktiya gêrîkan, ev derba dawiyê ye.
Ji nuha û pê ve, tu gêrîk dê careke din peyva gêrîktiyê nîne ser zimanê xwe jî.
SUrên got:
- Ka were, were birayê min î Serkumikê Berz, em ê ji jeraba mor a ku gêrîkan dilop bi dilop ji mirovan dizîbû û ji min re bera fiçiyan dabû, vexwin û serxwej bibin. îroj, roja me ya herî xwej e.
Siltên û Serkumikê Berz li bexçeyê ku ji Bexçeyên Babîlê jî xwejtir, dest bi vexwarina jeraba mor a ku wek zêr mang didakir. Şev bû. Tava heyvê her dever rohnî dikir. Gêrîkên li daristanê, di vê heyvrohê de, hîn bi kêftir bûn, qûnên xwe her di daran de didan û dixurandin. Tesîra borîzan, televîzyon, radyo û sînemayên Siltên ecêb çêbûbû. Ji ber ku hingî di daran de didan, tu nema bû ku qûnên wan hemû bimehiyana û nemabûna. Qûnên xwe bi dil û can di daran de didan. Ji nijka ve, ji wî alî, ji binê çiyayî dengek pêl bi pêl ber bi wan ve hat. Gêrîkan ev deng û ev sitran ji kevin de nas dikirin, lê wan ev ji bîr bikiribû çû bû. Guhên xwe danê û guhdarî kir.
Û gava ku wan ev sitran bihîst, qûnên xwe tavUê ji daran bi dûr xistin. Deng her diçû zêdetir dihat. Ji rojhUat, rojava, bajûr û bakur dihat. Ji erdê derdiket, ji ezmên dibariya. Ji gîha,

kulîlk û pelan, ji co û cobaran, ji sitêrkan, ji êgir û ji mija
212
li ser daristanê dihat. Bi ku de dizîvirîn, li ku dinihêrî ji wira dihat. Vê sitranê tijtek dianî bîra wan. Di dil û hinavên wan de tijtin dilivandin. 0 sitran qut nedibû. Ecêbiyek, helûbelek, xulxulek û tevgerekê dest pê kiribû... Çi dibû? gêrîkan jî fahm nedikir bê çi dibû, lê his dikir ku di wan de guhertinek çêdibe. Sitranê her dom dilcir. Gêrîk wek ku ji xeweke giran, tarî û xewneke kabûsî jiyar dibûn. Heta sibehê, ne qûnên xwe xurandin û ne jî raketin. Ew li daristanê rawestiyan û li vê sitrana ku ji her hêlê ve dihat guhdarî kir. Sitranê digot ku em gêrîk in. Wextekê, em jî gêrîkên wek gêrîkan bûn û welat û bajarên me yên wek bihujtê hebûn. Em bi xwe dixebitîn û me bi xwe dbcwar. Em wek hev û azad bûn. Em wê wextê gêrîk bûn, gêrîk! Her yek ji me, ne fîlê bi derewan bû. Em ne gêrîkên qejmer, qambihust û yên teqlîdê fîlan dikirin, bûn. Wextekê, me xwe qet piçûk nedidît û me destûr nedida tu kesî ku me piçûk bibîne. Em weha ne evd, ne xulam, ne jî kole bûn. Em serbixwe bûn, ajtî hebû, em wek hev bûn. Me bi hevdu re xwarin çêdikir û me bi hevdu re dixwar û vedixwar. Tu ferqa me tune bû. Sitranê digot, sitranê bi zimanê gêrîkan digot û gêrîkan ji gêrîkiya ku wan digot qey wan ew ji bîr kiriye, wek berê fahm dikir. Bi sitranê re agirekî hesretê jî hêdî hêdî xwe bera dilên wan dida. Wan bi hevdu re sitran digot û bi hevdu re tor ji avê dikijand, me bi keda xwe wek gergefê jikil dida hesinî û me bi hevdu re erd diajot. Me hijîrên bi gezik, navika kulîlkan, nektar, navika genimê bijîrej bi hevdu re berhev dikirin, me bênderên

wan radikirin û me ew bi hevdu re dixwarin. Em ne hêsîr bûn, ne kole bûn. Sitranê digot ku beriya ku em bibin kole, xulam û hêsîr, me bajarên xwe bi hevdu re ava dikirin û welatên xwe bi hevdu re xwej dikirin. Sitranê digot ku em ê seraya Siltanê Fîlan hilwejînin, hêlînên hudhudan xera bikin û koka zeriyan biqelînin. Yên dikin xan jî û yên xera dikin jî

213

gêrîk in. Sitranê digot ku di vê kaînatê de, tu hêz di ser hêza gêrîkan re tune ye. Yên ku seraya Siltên ava kir, Pîramîdên Misirê û Bexçeyên Babîlê çêkirin Icî ne? Yên ku ew qas bajar û welat ava kirin kî ne? Gêrîk... Sitranê digot ku gêrîkên ew qas pir, ew qas xurt dikarin zora fîlan jî bibin. Sitranê digot ku... 0 sitran ji çiya û deryayan dihat, ji ax, daristan û ronahiyan difuriya. 0 gêrîkan ev deng, ev sitran, wek germahiya dilên xwe pir baj nas dikirin.

Gava ku berbanga gewrik mîna kulîlkeke ronahiyê li ser dinyayê velcir, hemuyan bi hevdu re bang kir.

- Gêrîkê dengbêj, gêrîkê dengbêj!

0 wan dev ji daristanê berda û ber bi welat û bajarên xwe ve mejiyan. Êdî hemuyan dest bi fikira ku em gêrîk gêrîk in, kiribû. Dilên xwe bi xwe jewitandin û got ku em çawa ew qasî bi lez bûn fîl, hem jî fîlên qejmer û bi qasî serê derziyê piçûçik.

Bûbûn gêrîk. Sitranê hîn di destpêkê de, ew bi gêrîktiya wan hisandibûn, lê qet nediket serê wan ku ew ê bikaribin zora fîlan bibin.

Hudhudan tavilê xeber gîhand Siltên û got:

- Gêrîkan dev ji daristanê berdan û ber bi welatên xwe ve

diçin.
Siltên pirsî:
- Çi qewimî, birayên min î Serkumikê Berz?
Serokê hudhudan got:
- Ez pir jaj bûm ku gêrîk ji daristanê derketin. Ya rastî, gava wan wek fîlan qûnên xwe di daran de didan, bi wan pir xwej bû.
- Dikare çi qewimî be?
- Min pirsî, qet tu tijt ne qewimiye, Siltanê min. Gêrîkan jevekê, dibe ku êvarekê an jev nîvê jevê qûnên xwe ji daran bi dûr xistine. Li daristanê tev ne liviyane û weha rawestiyayî
214
mane. Wek ku li tijtekî guhdarî dikir, lê tu deng nehatiye bihîstin.
Siltên got:
- Ecêb e. Ev gêrîk mexlûqên dinyayê ên herî ecêb in. Hed û jeda wan qet tune ye...
- Ez ji Siltanê xwe re bibêjim. Dû re jî gava roj hilat ji daristanê derketine û berê xwe raste rast daye welarên xwe.
- Tijtek di vêya de heye, Serokê hudhudan. Na na, hema weha bê sebeb, tu mexlûq li vê dinyayê dev ji qûnxurandinê bernade. Hemû mexlûqên vê dinyayê ji bo qûnxurandinê hatine vê dinyayê. Mexlûqê ku îmkana qûnxurandinê carekê bi dest bixîne, careke din nema dikare dev jê berde. Tijtek di vêya de heye û hem jî ev gêrîk dê tijtekî bîne serê me, ez ji te re dibêjim.
- Siltanê min, ez jî bi taswas im.
- Ma tu xeber ji Gêrîkê Kulek tune ye? Le, ji zeriyên me?

Serkumikê Berz keserek kijand:
- Tune ye. Mixabin, tune ye, Siltanê min.
Siltên serê xwe bera ber xwe da û demeke dirêj fikirî. Dû re jî xortima xwe li ser pijta xwe gerand, ber bi daran ve mejiya û qûna xwe sipart dara çinarê. Mekîneya qûnxurandinê xist pajiya xwe û dest bi fikirandinê kir.
- Te ji bo çavdêriya gêrîkan, çend çivîk jandin?
- Heft sed û heftê û heft çivîk, Siltanê min.
- Ma ew qas çivîk têra çavdêriya wan dikin, Serkumikê min î Berz?
- Siltanê min, ev çivîkin pir bi lez in, ev pir bi lez in. Ev hudhudên ku hîn nuh bûne fîl in.
- Heft sed û heftê û heft çivîkên din jî bide firandin û bi dû wan re jî tu here û ji min re bi lez xeberên teze bîne.
- Li ser seran, Siltanê min.
Serkumikê Berz tevî heft sed û heftê û heft çivîkên nuh ta-
215
vilê firiya û xwe gîhand welatên gêrîkan. Wan hîn ji dûranê, ji bajaran dengên bi xezeb bihîstin. Gava nêzîkî li wan kir, deng fahm kirin.
Hemuyan bi hevdu re digot:
- Em gêrîk in, em gêrîk in! Em hatin xapandin, derew li me kirin. Em ne fîl in, em gêrîk in!
Serkumikê Berz got:
- Wey lawo! Çi bi van gêrîkan hatiye?
Tavilê firiya û xeber gîhand SUtên.
SUtên got:
- Bihêle, bila ew gêrîk bin. Ez ê nuha, gêrîktiyê rê wan bidim.

Serkumikê Berz got:
- Siltanê min, ne xwe, ew qas borîzanên me, ew qas televîzyon, sînema, radyo û rojnameyên me bi kêrî tu tijtî nehatin?
- Ma çawa bi kêr nehatin? Ma te nedît ku dimirin, lê dîsa jî dev ji fîlîtiyê bernedida. Min ji te re got ku tijtek di vêya de heye. Vî Hesinkerê Kulek rêyeke ku ji borîzan, televîzyon û sînemayên me bi tesîrtir peyda kiriye. Wekî din, ne mumkun e.
- SUtanê min, min pir lê kola, lê tu tijt tune ye .
Siltên mîna ku emir dida, got:
- Heye! Tijtek heye, em ê di nêzîk de, fahm bikin.
Tam di wê esnayê de, hudhudekî ku kumik û baskên wî tev li hevdu bûbûn, bi helûbelekê hat xwe Ji ser guliyê çinarê yê li ber serê xortima Silrên bû, danî û got:
- Siltanê min, gêrîk hemû sitranekê dibihîsin. Sitran ji wan re dibêje ku em gêrîk in, em nabin hêsîr.
Siltanê Fîlan xwe buxudand û got:
- Bila nebin. Kengî min panzdeh fîl jandin welatên wan û ew di aliyekî re ketinê û di aliyê din re derketin û gêrîk di
216
bin lingên wan de wek hevîr hatin sitrandin, bila ew wê gavê, nebin hêsîrên fîlan. Ger ez dîsa xwarinê ji ser wan qut bikim...
Herin, ji wan re bibêjin ku min gêrîktiya wan, li wan qedexe kir. Tavilê bifirin û biçin welarên gêrîkan û ji wan re bibêjin ku tu gêrîk dê nikaribe bibêje ku ez gêrîk im.
Hudhudan got:
- Li ser seran, Siltanê me.
0 ber bi welatên gêrîkan ve firiyan û emirê Siltên gîhand

hemû gêrîkan.
Nuha, sitran li hemû welatan jî belav bûbû. Ji her aliyî ve dihat bihîstin. Ji axê, ji ronahiyê, ji tariyê, ji ewran, ji her deverî, ji her deverî, gêrîkan di xewn û xeyalên xwe de jî hertim ev sitran dibihîst. Wan ev sitran dibihîst û ew hemû bi hevdu re jî tevî sitranê dibûn.
Ev sitran di eynî wextê de û di eynî jevê de, li bingeha rîhsoran jî hat bihîstin. 0 gêrîkên sor bi kêfeke bêsînor rawestiyabûn, mest bûbûn û li vê sitranê guhdarî kiribû.
Ji wê rojê û vir de, ev sitran li wê derê jî hertim dihat gotin. Ji her aliyî ve, ji ezman, zinar, kulîlk û deviyan dihat. Ji gava ku sitran hatibû bihîstin û vir de, rîhsor jî tevî wê bûbûn. Sitran qet nediqediya, mîna çemekî xurt, mîna Firat, Nîl û Tûnayê, ji kaniya gêrîktiyê ya esasî derdiket û bi xurtî diherikî.
Gêrîkê Kulek î Rîhsor ê ku ji kêfa rîha wî sorîkur dibiriqî, ji Serokê gêrîkên zerî yê li kêlelca xwe pirsî:
- Tu vê sitranê dibihîsî, vê sitrana gêrîkan a kevin?
Serokê gêrîkên zerî bi awayekî jajmayî pirsî:
-Sitranaçi?
Bi rastî, wî ne sitran, lê piçikeke deng jî nedibihîst.
Hesinkerê Kulek got:
- Sitran. Sitrana pajeroj û pêjeroja gêrîkan a mezin.
- Kî dibêje?
217
Hesinkerê Kulek got:
- Hemû lcaînat dibêje. Çiya, kevir, ezman, sitêrk û roj dibêjin. Masiyên di avê de û mar û kêzikên li erdê dibêjin.

0 ew jî bejdarî sitranê bû. Serokê gêrîkên zerî tu tijt fahm nedikir, jaj mabû û ziq li wî dinihêrî. Piçeke deng jî nediçûyê-
- Sitrana gêrîkan ji qanûnên fîlan bi hêztir e, ma tu fahm dilcî, Serokê birêz? Ma ev deng rê te? Sitrana gêrîkan wek qanûnên xwezayê ye, bi qasî qanûnên xwezayê saxlem û bi hêz e. Ma tu vî dengî dibihîsî?
Serokê gêrîkên zerî got:
- Na, ez nabihîsim.
Yê Hesinker got:
- Lahnet li te hatiye.
Serokê gêrîkên zerî got:
- Belê, ez gêrîkê rîhsor ê lahnetlêhatî me. Ma ger ez ne lahnedêhatî bûma, fîlan welatê min û hêlîna min weha ji hevdu belav dikirin?
Sitran her berdewam bû. Hesinkerê Kulek mest bûbû, hertijt ji bîr kiribû, Serokê gêrîkên zerî yê ku li kêlelca xwe jî ji bîr Iciribû û tevî sitranbêjan bûbû.
Bi vî awayî, ne gêrîkên rîhsor û ne jî Hesinkerê Kulek dizanîbû, bê wan ev sitran çend roj û çend jevan bi kaînarê re gotibû. Sibehekê, lê nihêrî ku grûpeke rîhsoran ber bi jêrê ve, ber bi dejt û welatan ve diçin.
Hesinkerê Kulek bi tirs bang lcir:
- Bi ku de, bi ku de?
Yên din bi awayekî aram û sergiranî got:
- Êdî ev hêsîrtiya me bes e. Em weha bipên û bipên, dê çi bibe? Em sed salan jî bipên, tu tijt çênabe. Em diçin.
Yê Hesinker pirsî:
- Bi ku de? Ma hûn weha bêyî ku ji min bipirsin, bi ku de

diçin?
- Em diçin welatên xwe.
- Fîl dê li wê derê we bikujin.
Serokê gêrîkên zerî yê li paj Hesinkerê Kulek bû, bang kir:
- Ew nikarin wan bikujin, nikarin wan bikujin!
- Em ê biçin û herçar aliyên welatan bi xendekan bigirin û em ê xendekan tije av bikin. Fîl jî dê nikaribin di ser van xendekan re derbas bibin û têkevin welarên me. A, em ê jî bi vî awayî ji hêsîrtiya fîlan rizgar bibin.
Hesinkerê Kulek bang kir:
- Nabe! Fîl li xendekan guhdarî nakin, ew ê di ser wan re derbas bibin.
Serokê gêrîkên zerî yê li paj wî bang kir:
- Fîl nikarin di ser xendekan re derbas bibin, hûn biçin û rizgar bibin.
Û xendekperest çûn.
Dû re grûpa zirtperestan ji hember dihat û digot:
- Em ê bijewitînin, bijewitînin, em ê welatê fîlan tep û duz bikin.
Hesinkerê Kulek pirsî:
- Bi ku de, bi ku de?
Zirtperestan bersiv da:
- Em ê biçin neteweyên gêrîkan azad bikin.
Bi dû wan re jî seyikperest hatin. Van ên ku dixwestin xwe bi fîlan biseyînin û wan bê hereket bihêlin. Pijtî wan jî çavrijperest hatin. Ew ê li ser çavên fîlan kom bûbûna û ew kor bikirana. Piştî çavrijperestan jî bîrperest hatin. Wan jî dixwest

bîran bikolin û fîlan di bîran de werbikin. Di nav wan de, mîxperest jî hebûn, ew jî ne hindik qelebalix bûn. Wan jî dixwest li herçar aliyên welatan mîxan bikutin û bi vî awayî gêrîkan azad bikin. Bi dû wan re grûpa xapînokan hat.
Wan jî digot ku ne gêrîkên sor, ne jî fîl, bijî gêrîkên azad û
219
serbixwe. Wan ê bi vî awayî, bejeke fîlan bbcapanda, fîl bera ber hevdu bidana û bi fîlên ku pijta gêrîkan digirtin re bûbûna yek û neteweyê gêrîkan bigîhanda azadî û serxwebûnê.
Hîn gelek grûpên gêrîkan ên din hatin.
Hesinkerê Kulek jî li ser rê rawestiyabû û ji hemuyan dipirsî:
- Bi ku de, bi ku de, birano, weha bi ku de?
Wan jî digot:
- Ber bi azadiyê ve.
Û tu tijtekî din nedigot.
Bi vî awayî, di hundurê çend rojan de, bingeha rîhsoran vala bû. Li bingehê, li ba Hesinkerê Kulek ên ku ji wî hez dikir, pê ewle û bawer bûn, man. Wekî din, Serokê gêrîkên zerî û bejeke peyayên xwe jî li wira man.
Hesinkerê Kulek î Rîhsor ji ber hemû tijtên ku bûbûn, pir li ber diket. Wî dizanîbû ku bê dê çi bihata serê gêrîkan û ji ber vê yekê, agir bi kezeba wî diket.
Gava hudhudan ev xeber gîhand Silrên, kêfa Siltên pir hat.
Got:
- Hij, dengê xwe qet mekin. Bila ew çar aliyên welatan bi xendekan ve dorpêç bikin. Ez ê jî du fîlên xwe bijînim û bejtan deynim ser wan, pireyan ava bikim û wan bajaran û wan welatan bi erdê bikim yek, bila ew jî wê çaxê bibînin,

tîq, tîîîq.
Gêrîkan li dora welat û bajaran, bi jev û bi roj, bi dU û bi can xendek kolan û ew tije av kirin.
Gava qediya, çûn ba Siltên û jê re got:
- Em ê êdî azad û serbixwe bijîn.
Silrên jî göt:
- Waaa, ne weha, bêhijên min? Ne xwe, hûn li hember min radibin?
- Em serî hildidin le, dê çi bibe?
220
Siltên got:
- Yanî hûn dibêjin qey tv neteweyên gêrîkan dê bikaribin li hember fîlên qeraseyên rnexlûqan serî hildin?
Gêrîkan got:
- Em nabêjin qey, em serî hildidin. Me serî hilda jî.
Siltan pir û pir keniya, bi zikê xwe girt û keniya. Hesinkerê Kulek jî dengê wî bihîst.
Gava bihîst, got:
- Heywax! Malik li gêrîkan xera bû. SUtan dê li ser ruyê erdê gêrîkekî jî nehêle. Ew ê kolca me biqelîne. Ez vî kenî hîn ji kevin de nas dikim, ne elameta xêrê ye.
Pşcî ku Siltan pir û pir keniya, got:
- De heydê fîlên min, lejkerên min, de heydê hudhudên min, çivîkên min, de biçin, divê îroj hûn li welarên gêrîkan kevir li ser kevirî nehêlin û gêrîkan ji vê dinyayê biqelînin. Û fîlan xendek pir bi hêsanî derbas lcirin û ketin welatên gêrîkan. Hengameyeke weha çêbû ku toz û dûman tev li hevdu bûn. Di bin lingên her fîlelcî de, bi milyonan gêrîk bi

hevdu re dieciqîn û jire jira xwînê bû, li erdê diherikî.
Gêrîkan di demeke kurt de, got çîz:
- Siltanê me, me di te de kir, tu di me de neke. Me eftl bike.
Me efu bike, da ku em heta qiyametê, ji te re bibin evd.
Me nizanîbû ku gêrîk tu carî nikarin bi fîlan re derxîne serî.
Em bi wan rîhsoran hatin xapandin. Azadiya me jî û serxwebûname jîhûn in...
Serokê hudhudan dîsa ket navberê û fîlên hêrsbûyî yên
agir ji devê wan diçû, nerm kirin û bi vî awayî gêrîkên mayî,
ji mirinê xelas kirin.
Rîhsorên ku mabûn jî reviyabûn û xwe li ser dareke bilind
vejartibû.
Wan got:
- Em jaj in. Divê em tevî çavrijperestan bibin, çavên fîlan
221
derxînin û heyfa xwe hilînin.
0 gêrîkan ji bo çavrijandinê, êrîjî FUistanê kir. Tavilê li ser
çavên fîlan civiyan.
Dû re çûn ba Silrên û got:
- Em azad û serbixwe nin. Em ê çavên hemû fîlan birijînin.
Siltanê Fîlan pir û pir keniya, bi zikê xwe girt û keniya.
Hesinkerê Kulek ê ku dengê w* bihîs% got:
- Heywax! Heywax û heywax, d'n*% çend welatên gêrîkan
bi erdê re bûn yek.
Û SUtanê Fîlan ferman da fîlên xwe:
- Xortimên xwe bi avê dagirin û bipejiqînin çavên hevdu.
0 fîlan weha kir.
0 fîlan dîsa êrîjî welatan kir. Û gêrîkan dîsa got, çîz.

Gêrîkên ku dîsa xwe di nav pelên dareke bilind de vejart, vê carê çûn û tevî seyikperestan bûn. Gêrîkên seyikperest jî bi qalindbûneke bi qasî bihustek-du buhostan xwe bi fîlan seyandin. Siltanê Fîlan dîsa keniya.
Gava Gêrîkê Kulek dengê wî bihîst, agir bi kezeba wî ket.
- Heywax û heywax! Ger weha biçe, welatên gêrîkan dê bi yekcarî bên hilweşandin.
0 siltanê Fîlan ferman da:
- Birevin avê, birevin co û cobaran!
Fîl ber bi co û cobaran ve reviyan û xwe di cîhê kûr de dakir. Avê gêrîkên ku xwe bi fîlan seyandîbû, dan ber xwe û birin. Ji xwe, çiyagerok hîn berê li deştê, ji aliyê fîlekî bi tenê ve hatibûn eciqandin. Ew careke din bi ser xwe ve nehatin û li çiyayan negeriyan.
Hemû ceribandin pûç derketibûn. Di her ceribandinê de, Siltanê Fîlan keniya; Hesinkerê Kulek got ku heywax, çend welatên gêrîkan hilwejiyan; gêrîkan got, çîz û Serkumikê
222
Berz ket navberê û ew dan efukirin.
Di dawiyê de, rîhsorên ku ji ber jûran filîtibûn westiyayî, bê taqet, seqet û bê hêvî bi jûn de vegeriyan. Wan nikarîbû li çavên Gêrîkê Kulek î Rîhsor binihêriya. Gava ku çûbûn, ji Hesinkerê KuJek re çi qas sixêf kiribûn. Ne xayintî, ne nemerdî û ne jî tirsonektiya feqîrê Kulek hijtibûn. Hesinkerê Kulek ev hemû ji bîr kirin, birînên wan derman kirin, dan derman kirin û li ber dilên wan çû û hat. Hewildan hewildan bû. Di her hewildanekê de, pareke têkçûnê hebû. A va, rêk çûbûn.

Heçî Siltanê Fîlan bû, ji kêfa difiriya. Bi taybetî pijtî ew qas tecrubeyan, êdî tu gêrîkekî dê careke din serîhildan neaniya bîra xwe jî. Tew ew qas bûbûn dijminên rîhsoran ku gava li deverekê rîhsor didîtin, bi carekê pir hêrs dibûn û ew wê gavê perçe perçe dikirin. Êdî tu rîhsor jî nema dikarîbû di nav gêrîkan de bisitiriya. Lê, ev tecrube li ser Fîlistanê dîsa pir giran rûnijtibû. Gelek welatên gêrîkan hilwejiyabûn, bi milyaran gêrîk miribûn. Mahneya wê ew e ku ji bo fîl û hudhudan dê hindikgêrîk bixebitin.

Serokê hudhudan got:

- Li ber nekeve, Siltanê me. MexJûqên dinyayê yên herî bi lez zêde dibin, gêrîk in. Di hundurê çend salan de, dibe ku hezar caran li wan miriyan zêde bibin.

Siltan keniya û got:

- Ne xwe, weha ha? Çi xwej! Me koka rîhsoran jî anî. Ew careke din, ne dikarin gêrîkan bixapînin û ne jî bên ba hevdu. Ev rîhsor çi kawik, çi mexlûqin bêhij in. Bejeke wan jî ji bo ku fîlên me li hember me bicixirîne dixebitîn. Fîlên me jî dû re bêyî ku hayê min jê çê bikin, ew pelixandine... Tîq tîq, . AAAAA_^ tiuiiq...

Hesinkerê Kulek ev ken jî bihîst. Ji qehra xwe, dikira biketa û bimira.

223

Got:

- Nuha jî ji ber serkevtina xwe dikene. Aaaax, ehmeqên me!

SUtên got:

- Borîzan, televîzyon, rojname, roman û bi taybetî jî ronakbîrên

dibistana ku gêrîkan dikin fîl qedandine, esil dê ji nuha û pê ve, bi kêr werin. Êdî ji bo neteweyên gêrîkan qet tu ronahî nema. Bêhêvîtî adana hêsîriyê ye. Bêhêvîtî maka koletiyê ye. Bêhêvîtî hUwejîna dil e. Em ê bêhêvîtiyê bêtir bikin. Ronakbîrên li dibistana ku gêrîkan dike fîl xwendine dê birêvebirina radyo, televîzyon û rojnameyan têxin destên xwe û ew ê sal duwanzdeh meh bi jev û bi roj bê rawestan behsa bêhêvîtiyê bikin.

- Ji nuha de, dest pê kiriye jî.

- Çi xeber ji zeriyên min hene?

- Ew li ba rîhsoran in. Rîhsoran yek bi yek taqîb dilcin, heta li bêhna wan jî guhdarî dikin û digihînin min.

- Le, Hesinkerê Kulek?

Serkumikê Berz got:

- Ez nizanim.

Siltanê Fîlan got:

- Ma ji nuha û pê ve, Hesinkerê Kulek sax be, dê çi feydeya wî hebe, çi ji destên wî tê? Ji nuha û pê ve, tu tijt nema dikare ji destên wî bê... Kîjan gêrîk dê careke din guh bide ehmeqiyên wî û serî li hember min rake?

Serkumikê Berz got:

- Kuleko miriye. Ger nemiriba, nedihijt ku gêrîk vê ehmeqiyê bikin.

Siltanê Fîlan hîn pir, hîn û hîn pirtir ji dil keniya. Kenê wî li çiyayan olan da. Hesinkerê Kulek ev kenê wî bihîst, hemû lajê wî lerizî.

Serê sibehekê gava şefeqê lêxist û tav mîna kulîlkeke ronahiyê ya mezin ku qat bi qat sîn, sor, turuncî û spî derket, Hesinkerê Kulek bi sitraneke ku ji herçar aliyî ve dihat, şiyar dibe, diçe meydanê û bi hemû rîhsorên ku li wê derê civiyanê re dipeyive.
Gêrîkên ku bûbûn rîhsor, bi awayekî çavtirsiyayî, bê hêvî û bê hal, bi dû hevdu de dihatin bingeha Gêrîkê Kulek. Bingeh di hundurê çend mehan de tije bû, cîh rê de nema. Çiya, gelî, çol û beyar dîsa bûn gêrîk.
Gêrîkan bi awayekî situkijiyayî, dixwernedîtî, xwe li ber tavê dirêj kiribû, nedipeyivîn, bi tenê difikirîn. Yên ku wek wan bûbûn rîhsor, ji jêrê, ji welatên gêrîkan bi xeberên xerab î ne xwej û xemgîn dihatin. Li bingehê, êdî gêrîk li ser hevdu rûdinijtibûn.
Her ku diçû, li welatên gêrîkan rewj xerabtir dibû. Her fîlelcî ji xwe re serayek û ji bo wê serayê jî textekî wek ê Siltên dabû çêkirin. Wekî din jî bexçeyên eyn wek bexçeyê SUtên ku bi hemû dar û kulîlkên dinyayê ve xemilandî... Her ku gêrîkan dida, wan jî dixwest. Çi bihata hijên wan, dilên wan bibijiya çi, emir dida gêrîkan. Silrên ji xwe re, heft seray û janzdeh textên din ên rengareng dabûn çêkirin. Qotên hemû çiyayan û perên deryaya mezin bi kojk û serayên Siltên û bi bexçeyên wî ve hatibûn dagirtin. Gêrîkan ji her hudhudekî re hêlînin weha çêkiribûn ku ji roja çivîk bûbûn çivîk û vir de, hêlînên weha nedîtibûn. Hêlîn li ser çinarên herî bilind hatibûn avakirin. Gêrîkan ji bo wan xwarin dikijandin
22$
serê çinaran, heta ber devê hêlînên wan. Ger wan ji Siltên re

ava heyatê jî peyda bikira û bianîya, Silrên dê pijtî kêf û jahiya çU roj û çil jevan, ava heyarê vexwara û bigîhajta gîhaneka nemiriyê. Pijtî wê, hemû fîl û hudhudan jî dê ava heyatê bixwesta û gêrîk dê dîsa bi awayekî pir feqîr, birçî û tazî têketana rê. Di bin gir û çiyayan de, embar hatibûn kolan û hundurê wan bi xwarinên cuda cuda ve mijt bûbûn. Gêrîkan hîn jî embar dikolan û ew bi xwarinên dinyayê yên ku nayên peydakirin ve dadigirtin.

Rawestin li gêrîkan tune bû, sal duwanzdeh meh her dixebitîn. Ka ew dema berê, gava direviyan daristanê û teqlîdê fîlan dikir? Ka ew dema wek berê, gava ji Siltanê Fîlan nektar, navika genim û kulîlkan dbcwestin û derdiketin huzûra wî? Tew wan rûyê Serkumikê Berz jî ancax ji salê carekê dikarîbû bidîta. Hemû xezîneyên ser ruyê erdê û yên bin erdê jî ji fîl û hudhudan re kijandibûn... Tevî vê jî ne tu fîlî û ne jî tu hudhudî li ruyê wan dinihêrî. Rojên beriya têkçûn û tevkujtinê, wek xewneke bihujtê mabûn.

Her ku wan dida, fîl û hudhudan jî hîn hîn bêtir dbcwest. Êdî xew qet nediket çavên tu gêrîkî. Fîlan li hember vê xebata ku hal di mirovî de nedihijt, ancax bi qasî ku ew nemirin, xwarin didan wan. Embar heta ber dev tije dibûn û xwarin tê de genî dibûn. Fîlan xwarina wek a herroj dida gêrîkan. Piçek jî jê zêdetir nedida wan. Her çi hîkmet be, ew gêrîkên ku bi zikekî têr û yekî birçî dbcebitîn û firset nedidît ku serên xwe bbcurînin, her zêde dibûn. Makgêrîkan bê rawestan bi milyaran hêk dikirin. Ev jî pir bi kêrî fîlan dihat. Her ku diçû, fîl tiraltir û qelewtir dibûn. Hudhud wek dermalan ew qas qelew bûbûn ku hema hema nema dikarîbû bifiriyana.

Ger ne ji tirsa fîlan bûya, qertelên rej dê hudhud çi xwej bilcirana êm. Wan ê rojê bi hezaran hudhudên bi bez dabelihandana. Gava qertelan hudhud wek hîzê rûn weha bê here-
226
ket didîtin, situyê wan dikişiya û av bi devên wan diket.
Siltan li seray, erd, xizne, embar û bexçeyan digeriya û digot:
- Sala bê, hatina me dê deh qatî vêya be.
0 sala pijtî wê hatin dê bibe bîst qat.
Siltên dîsa qîma xwe netanî, ruyê xwe diqermiçand û digot:
- Sala bê sed qat...
Gêrîk jaj mabûn. Ew qas xwarin, mal, mUk û xizne heta qiyametê, têra Siltên jî sulala wî jî û ger sulala wî sed caran zêdetir bibe jî dikin û zêde ne jî... Ger emirê dinyaya me rêra qiyametekê, pênc qiyametan bike jî van xwarinan dîsa rêra fîlan dikir. Êêêê, baj e, ma çi derdê fîl û hudhudan hebû, ji bo çi ew qas xwarin hiltanîn? Rîhspî û aqilmendên gêrîkan digot qey ev fîl û hudhud bi dînîtiya hilanînê ketine. Têrnexwarî û nedîtiyeke ecêb... Mexlûqên din mexJûqên weha têrnexwar qet nedîtibûn. Hemû dinya, tevî gur, kurm û kêzikan, tevî mar û jahrmaran, bi hemû mexlûqan, li hember van mexJûqên nuh jaj mabûn û sar sekinîbûn. Ev hudhud û fîl, ev rêrnexwar, ev nexwejên hilanînê dîn bûbûn. Mexlûqan jî nizabû ku bê ew ê li hember van çi bikin.
Hem ev hilanîn bi çi dibû mal? Bi mirin, nexwejî, seqetî, feqîrî û birçîbûna bi milyaran gêrîk dibû mal. Dilên fîlan bi van gêrîkan qet nedijewitîn, bi ser de jî qet ji wan hez nedikir û di firseta herî piçûk de jî ew piçûk didîtin. Di desrpêkê de, Siltên gotibû ku gêrîk ji esilê me tên û wan jî bawer kiribû.

Ji bo her pariyê ku wan bi cûtinekê dadiqurtand, bi milyonan gêrîk canên xwe didan. Ji bo wan xwafinên zêde yên ku di embaran de genî dibûn ku wan piçek jê nedida gerîkan û dirijandin deryayan, bi milyonan gêrîk keda xwe û xwîna xwe dirijandin û dimirin.

Gêrîkê Kulek î Rîhsor jî li xeberên ku ji jêrê, }i Fîlisranê, ji

227

welatên gêrîkan dihatin, guhdarî dikir û ji hêrsa xwe dîn dibû, lê ma çi ji destên wî dihat...

Wîdigot:

- Ev dîn bûne. Ev çaxa dinyayê ya dînbûyî, rezîlbûyî, çavbirçî û egoîst jî dê derbas bibe, lê kengî?

0 tu tijtekî din nedigot. Ji qehran dimir. Gava fîl fîl bûn jî ew qas dînbûn, egoîzm, zilm û rezaletî layiqî tu benderuhî û tu mexlûqî nediditîn. Gava gêrîk rizgar bibin, fîl jî nesilên fîlan jî dê bi gêrîkan re bextiyar bibin. Ew qas hewUdan, egoîzm, rezîlbûn, zilm û jikence çi bûn? Ev fîl dîn bûbûn, lê divê sînorê dînbûnê jî hebûya. Fîl û hudhudên ku ev zUm li gêrîkan dikir, ji tirsa jî dîn dibûn. Wan gêrîk bi qasî gêrîkan jî nedidîtin, lê dîsa jî ji tirsa xew nediket çavên wan. Lahneta dinyayê ya mezin, lahneta tirsê li wan hatibû. Tevî ku embarên wan bi xwarinên ku têra sed salan û xizneyên wan bi zêrên ku bi qasî têra hezar, deh hezar salan bikin tije bûn jî wek ku ew ê sibehê birçî bimînin, ditirsiyan. Ew ji bayê ku dihat, ji ava ku diherikî, ji ronahiya ku diguvguvî û dihat, ji ezmên, ji axê, ji bêhna kulîlkên ku dinya dagirtine, ji pinpinîkên basktenik ditirsiyan. Ditirsiyan û embar dikirin, embar dikirin û ditirsiyan.

Gêrîkan li welatan û li bingehê nema îdare dikir. Gêrîkên ku bûbûn rîhsor û ji welatan hatibûn, nikaribû di cîhê xwe de rawestiyana, simbêlên xwe di hevdu de didan û her digot:
- Divê em çi bikin, em çi bikin, em çi bikin?
Gêrîkê Kulek î Rîhsor jî hem ji xwe û hem jî ji her rîhsorê ku lê rast dihat her dipirsî:
- Divê em çi bikin, em çi bikin, kêr gîhajt hesrî, divê em çi bikin?
Pijtî bûyera mezin, yanî pijtî têkçûn û qedîamê, çi rîhsor, çi ne rîhsor, baweriya hemû gêrîkan bi Hesinkerê Kulek û rîhsorên hevalên wî yên dest bi tûyik ku bi wî re li bingehê
228
man û beşdarî jerê fîlan nebûn, bêtir bûbû. Ji peyva wan dernediketin.
Gêrîkê Kulek jî ji sibehê heta evarî dixwend, li gêrîkên ji welatên gêrîkan dihatin, li gêrîkên rîhsor û bi taybetî jî li yên dest bi tûyik guhdarî dikir, bi wan dijêwirî û difikirî. Ya rast, hemû gêrîk li rêya ku bikarîba ew ji vê zilmê rizgar bikira, difikirîn û digeriyan.
Hesinkerê Kulek hîn ji destpêkê û vir de, behsa ava ku dibû kelmizo dikir, lê yên din tu tijt ji vê peyvê fahm nedikir û henekên xwe pê dikirin. Wan digot ku av li ku, gêrîk li ku.
Ew çi dibêjin, bila bibêjin, çi qas fahm nekin jî bila fahm nekin, Gêrîkê Kulek dev ji fikira ava ku dibû kelmizo ber. nedida.
Rojekê, hemû gêrîk li meydanê civiyan û bangî Hesinkerê Kulek kir. Meydan êdî têra ji hezarî yekê gêrîkan jî nedikir.
Ew ji hezarî yekê gêrîkan jî li meydanê li ser serê hevdu bûn.
Gêrîkê Kulek hat û vê carê derket ser guliyê dara qizwanan.

Wî dê xîtabî qelebalixiyeke hîn mezintir bikira, ji ber vê
yekê, divê dara ku ew derketa ser, hîn bilindtir bûya. Gava
ew derket ser darê, qelebalixiyê bi hevdu re bang kir:
- Me falim kir! Me fahm kir! Me fahm kir!
Hesinkerê Kulek ji wan pirsî:
- We çi fahm kir?
- Bêyî ku av bibe kelmizo...
- A, ger we ev fahm kiribe, ji bo ku em zora fîlan bibin,
em ê di demeke kurt de rêyekê peyda bikin. Ger mirov kelmizobûna
avê fahm kiribe, ew tê wê mahneyê ku av bûye
kelmizo... Bêyî ku av bibe kelmizo, tu tijt çênabe.
Gêrîkan ji dil bang kir:
- Me fahm kir, çênabe!
- Gava ku av bû kelmizo jî rêya têkbirina fîlan dê hêsan
bête peydakirin.
229
Gêrîkan bi bawerî bang kir:
- Dê bête peydakirin!
Dengê wan li çiya, dejt, gelî, co û cobaran, daristan û ezmanan
olan da:
- Dê bête peydakirin! Dê bête peydakirin! Dê bête peydakirin!
Ronahiya hêviya ku di dilê Gêrîkê Kulek î Rîhsor de hebû,
mezin bû û ew bi kêfeke ew qasî mezin ku di dilê wî de hilnedihat
ji ser darê daket û berê xwe da jikefta xwe. Diviyabû
xwe tavilê bigîhanda pirtûkên xwe. Pirtûka herî qerase ya
mijtzanîn ji ser refikê daxist. Tam gava ku wî dê ew bixwenda,
Serokê gêrîkên zerî li hember wî sekinî û jê pirsî:
- Ev av çi ye, ev kelmizo çi ye?

Hesinkerê Kulek ew ji bîr kiribû çûbû, li ruyê Serokê gêrîkên zerî nihêrî nihêrî, li tijtinan geriya û bêyî ku tu tijtî bibêje berê xwe da pirtûka xwe û bi lez dest bi xwendinê kir.
Di dilê wî de, sitranekê ji nijka ve dest pê kir... Serê xwe ji ser pirtûka xwe rakir, li hawîrdorê guhdarî kir. Sitran ji dUê wî dihat. Demeke dirêj li dilê xwe guhdarî kir, dû re sitran mezin bû û ji hawîrdorê hat. Dengê sitranê ji pirtûkê jî dihat. Ji gêrîkên ku razabûn, ji devê mûristanê û ji dîwaran jî dihat. Serokê gêrîkên zerî ji zû de razabû. Hesinkerê Kulek li wî guhdarî kir, dengê sitranê qet ji wî nedihat. Derket derve, li sitranê guhdarî kir. Sitran ji sirêrkan, ji heyvê, ji jevê, ji zinaran, ji gîhayan, ji avên diherikî, ji bê, ji jînahiya ezmên û ji nava axê dihat. Li meydanê nihêrî, dît ku gêrîkan mîna ku mêja hunguv dizê, xwe bi hevdu zeliqandibûn, meydan heta ber dev dagirtibû û tev nediliviyan. Bêhna xwe ne distendin û ne jî berdidan, weha hijk bûbûn û mabûn. Hesinkerê Kulek ber bi wan ve çû, ew mîna ku ruh di wan de tune ye, qet tev nediliviyan.
Gêrîkê Kulek pirsî:
230
- Çi ye? Di vê nîvê jeva hanê de, çi li vê derê qewimiye?
Gêrîkan qet tu bersiv neda wî, ne tev liviyan û ne jî xuya kir ku wan dengê wî bihîstiye.
Gêrîkê Kulek li vî alî û wî alî pirsî, lê nihêrî ku tu kes tu gotineke wî jî nabihîse. Herkes daxil bûbûn û çûbûn. L£ geriya û pirsî û di dawiyê de, di nav wê qelebalixiyê de, ji rîhsorên dest bi tûyik hevrêyekî xwe yê kevin peyda kir... Ket milê wî û got:

- Hevalo, çi li vê derê qewimiye, ji min re bibêje? Min di hemû jiyana xwe de, tu carî gêrîk weha nedîtine, bibêje hevalo, çi li vê derê qewimiye?
Yê din bi dengekî pir hêdî got:
- Hiiiijjj, hiiiij, em li sitranê guhdarî dikin.
Gêrîkê Kulek pirsî:
- Kî vê sitranê dibêje?
Hevalê wî bi awayekî jajmayî û bi guman li wî nihêrî.
- Çawa, qey tu vê sitranê nabihîsî, hey hevrêyê min î Hesinker? Çawa tu Serokê me bî, dil, serî û fikira yên dest bi tûyik bî û tu nabihîsî? Ev sitran ji dilê me û ji fikira me tê. Evsitran...
Gêrîkê Kulek bijirî, bijirandina wî di tava heyvê de, mîna hêviyê xwejik bû.
Gêrîkê Kulek pirsî:
- Ev sitrana çi ye?
Hevalê wî got:
- Ji dilê xwe bipirse. Li dilê xwe guhdarî bike, li tava heyvê guhdarî bike, li vê qelebalixiya gêrîkan guhdarî bUce, dinya bi sitrana me bi kulîlkan ve dixemile, li dinyayê guhdarî bike, li ava diherike guhdarî bike, li hemû mexlûqên dinyayê... Nuha, hemû mexlûqên kaînatê li ser piyan in...
Herdu hevalan bi kêf hevdu himbêz kirin. Sitran her xurt dibû û xwejiktir dibû.
231
Şefeqê lê xist, bila jefeqa me hemuyan lê bbce, ronahiya li aliyê rojhilat wek kulîlkeke sor î mezin vekir û xwe gîhand heta orta ezmên.

Gêrîkê Kulek derket ser dara qizwanan. Di nav ronahiyeke boj a bê ser û ber de dihat dakirin. Destê xwe danî ser dilê xwe û dest bi peyvê kir:
- Hevalno, birano, hevrêno, neteweyên gêrîkan gelek êj kijandin. Ji gava ku dinya bûye dinya û vir de, tu nesilê mexlûqan êja ku me kijandiye, nekijandiye, zilma ku me dîtiye, nedîtiye.
Dengê sitranê her ku diçû bUindtir dibû û ji her perçeyê dinyayê dihat. Ev sitran mîna kulilka dinyayê ya herî muhtejem wek dil, hezkirin, germahî, dostanî, xwejUcahî, biratî, wekhevî û ajtiyê vedibû. Azadî bûbû kulîlka ronahiyê ya li aliyê rojhilat û vebûbû. Vê sitranê hemû ezman dihejand û dinya rohnî dikir û azadî lê belav dikir.
- Hevalno, welat û bajarên gêrîkan...
Qelebalixiya ecêb a li hevdu siwar bûbû, bû yek deng û bang kir:
- Em dizanin, em dizanin!
- Binê welat û bajaran...
Qelebalixê bang lcir:
- Em ê binê wan bikolin, em ê bikolin!
- Hevalno, wê gavê pêjniyareke min ji we re heye.
- Hosteyê me, pêjniyara te li ser serên me.
- Serokê gêrîkên zerî li wê jêrê ye, wî hilkijîne vê derê, ba min. Hesabekî min bi wî re heye.
Çar xortan, Serolcê gêrîkên zerî anî û tavilê hUkijand serê dara qizwanan, ba Hesinkerê Kulelc
Hesinkerê Kulek got:
- Nuha, hem li min û hem jî li Serokê gêrîkên zerî baj binihêrin.

232
Destê xwe yê rasrê dirêj kir, destê yê Hesinker mezin û xurt bû, rîha Serokê gêrîkên zerî ya sor î biriqandî kijand. Rîha dirêj di destê wî de ma. Di jûna rîhê de, rîheke zipîzer kil dibû.
Hesinkerê Kulek got:
- We dît? Fîlan zeriyên xwe heta li ba min jî bi cîh kirine, we dît?
Hemû rîhsoran bi hevdu re bang kir:
- Me dît!
- Nuha, hûn hemû berê xwe bidin hevdu û bi rîhên hevdu bigirin. Bila herkes rîha herkesî bikijîne.
Hemuyan rîhên hevdu kijandin. Di bin rîhên gelekan ên sor de, rîhên zer derketin.
- Bi rîhên wan ên zer bigirin.
Gêrîkan bang kir:
- Me pê girt!
- Serên zeriyan jê bikin û bînin di bin vê darê de, li ser hevdu kom bikin.
Wî bi xwe jî, bi rîha Serokê gêrîkên zerî yê ku li ba wî bû girt û di wê deqîqeyê de serê wî ji gewdeyê wî hUqetand û avêt bin darê. Û di bin darê de, ji serên zeriyan girek çêbû.
- Nuha, ji min re bibêjin, em ê binê welat û bajarên gêrîkan bi kîjan hêzê û çawa bikolin? Ma hêza me dê rêrî kolana binê vê dinyayê bike?
Gêrîkan hemuyan bi hevdu re bang kir:
- Dê têr bike! Gava ku hemû gêrîkên dinyayê bibin yek...
Çavên Hesinkerê Kulek ji bextiyariyê biriqî û got:

- Gava ku hemû gêrîkên dinyayê bibin yek...
Gêrîk, dinya, ax, av, ezman, mexJûq bûn sitran û ev gotinên
ha bê rawestan tekrar kirin.
Hesinkerê Kulek î Rîhsor got:
- Wê gavê, de heydê rêkevin rê û li welat û bajaran belav
233
bibin, bila sitrana we li hemû dinyayê olan bide. Bila guhê
ku nebihîse, çavê ku nebîne, dUê ku hez neke û serê ku bawer
neke nemîne. Gêrîkên hemû dinyayê bibin yek!
Zingînî ji Dinyayê hat.
- Gêrîkên hemû dinyayê bibin yek!
Û gêrîk ketin rê, dejt, derya, daristan, avên kûr derbas kirin
û ev sitrana herî xwej û biaqil gîhand heta quncika dinyayê
ya herî xewle. Mexlûqê ku nebihîst û gêrîkê ku bawer
nekir nema... Siltanê Fîlan, Serkumikê Berz û fîlên din jî bihîst.
SUtan keniya:
- Haaah haaaah! Piça êqU di serê we de tune ye, gêrîkno!
Hemû gêrîkên dinyayê dê bibin yek û binê dinyayê bikolin,
hela bila bikolin û em bibînin.
Serkumikê Berz jî ji ber vê bêhijiya gêrîkan, pir hêrs bûbû:
- Hela bila bikolin, bila bikolin, em ê jî wan weha bUdn
ku ew ê dîsa nikaribin serî hildin.
Siltanê Fîlan got:
- Gêrîk heta nefirin, rêk naçin.
Serkumikê Berz bersiva wî da:
- Ev firiyan, Siltanê min.
- Hiiij, bila tu kes pê nizanibe ku em bi wan hisiyane ku
ew ê binê dinyayê bikolin. Em ê vê hêviya wan a dawiyê jî ji

destên wan werbigirin, dû re ev mesele diqede. Pijtî ku wan binê erdê kola, em ê wî Kulekî jî bigirin. Hiiij, birayê min î Serkumikê Berz, hiiiijjj!
Serkumikê Berz got:
- Divê em dengê xwe nekin.
Baskên xwe yên ku ji ber qelewbûnê giran bûbûn, bi kêf li hevdu xistin û ber bi welatên gêrîkan ve firiya. Ji jêrê dengê sitraneke ecêb, germ, dost ku mirov ji rê dibir dihat. Vê sitrana ha dilê wî jî nerm dikir û ew jî dawetî xweşikahiyê di-
234
kir. Ger Serkumikê Berz hebekî din jî bimaya, ew ê jî bi ber vê sitranê biketa û nikarîba dîsa vegeriya ba SUtên.
Bi Iez ji wê derê bi dûr ket û hat Fîlistanê, lê ji SUrên re qet behsa vê sitranê nekir. Sitranê ew mest kiribû û bi temamî guhertibû. Dibe ku Siltên jî rojekê ev sitran bibihîsta û li gora wê, li tijtinan bifikiriya. Feqîrê Serkumikê Berz ji ku dizanîbû ku Siltan dê qet tu carî nikaribe bibihîse!
- Hah haaah!
SUtanê Fîlan dikene û li benda wê roja xwe ya ku ew ê derba dawiyê li gêrîkan bixe, radiweste. Gêrîkê Kulek jî wek hertim, ev kenê wî yê dirêj bihîst û ew jî bi bêsebirî li benda wê roja ku binê dinyayê dê bête kolan, radiwestiya. Wî dizanîbû, wî dizanîbû ku ew ê nikaribin binê dinyayê bikolin, lê hela bila carekê dest pê bikin...
Gêrîk bi rojan bi mehan mejiyan, çûn û çûn, xwe gîhand hemû welat û bajarên gêrîkên dinyayê. Mesaja ku dibêje, hemû gêrîkên dinyayê bibin yek, ji hemû gêrîkan re got. Û ev mesaj ji bajûr heta bakur, ji rojhilat heta rojava, li hemû dinyayê

wek sitranekê belav bû... 0 gêrîk bûn yek û dest bi kolana binê dinyayê kir. Binên welat û bajaran bi dû hevdu re dihatin kolan. Ew sitrana mezin a ku ji dilên wan dihat û ji aliyê çiya, kevir, ax, av, gur, çivîk, kurm û kêzik û mirovan ve dihat gotin, ji wan re dibû pijt.

Serkumikê Berz û hudhudên din her roj, bi derketina rojê re diçûn li welat û bajarên gêrîkan digeriyan. Li ser welat û bajaran difiriyan û çi li wan deveran diqewimî, digîhandin Siltên.

Li gorî fikira Serkumikê Berz, li bajaran aramî hebû, gêrîk ne bûbûn yek û ne jî dest bi Icar kiribû. SUtan li ber vêya diket. Gêrîk jî ji bo xwe ejkere nekin, bi rojê ji Siltên re û bi jevê jî ji bo xwe dixebitîn. Axa ku ji binê erdê derdiket jî wenda

*35

dikir. Ew qas ax datanîn kî derê? A, ev bi dizî bû.

Gêrîkan di demeke kurt de, binên welat, bajar û dinyayê kolan. Û bi vî awayî, hat îsbatkirin ku hêza gêrîka ji hemû hêzan û sitranên wan ji hemû qanûnan hîn bi hêztir in. Gêrîkan li ser qotê çiyayekî bilind agirekî mezin pê xist û bi vî awayî xeber da Gêrîkê Kulek î Rîhsor ku binên hemû welat û bajaran hatine kolan. Gêrîkê Hosteyê Hesinker hîn di bin erdê de dixebitî. Li jêrê, kulmek du kulm axa wî mabû, gava wî ew jî bikijanda jorê, karê wî dê biqediya. Ji nijlca ve, dUê wî û dora wî bi sitraneke jahiyê ya bi qasî ku mirov nikaribe texmîn bike xwej ve hat dagirtin. TavUê derket derve, lê çi bibîne, agirê li serê çiyayî her ku diçû mezintir dibû û wek rojê dinya di nav ronahiyê de dihijt.

Gêrîkê Kulek î Rîhsor ji gêrîkên li dora xwe re got:

Serên wan gêrîkên zerî yên ku me ew li çiyayî jê kiribûn
û vejartibûn, ji min re bînin...
Serên gêrîkên zerî ji xwe hazir bûn, li hember, di kortalekê
de bûn.
Tam di vê esnayê de, kevokeke spîboz û wek ronahiyê bi
jewq ji ezmên daket. Gêrîkê Kulek ber bi wê ve baz da, hevdu
himbêz kirin.
Hesinkerê Kulek got:
- Ez li benda te bûm, tu bi xêr hatiyî xwijka min. Te çawa
dizanîbû ku binê dinyayê hatiye kolan û tu hatî?
Kevokê got:
Min ronahiya ku li serê çiyayî teqiya dît, min sitran jî bihîst
û min baskên xwe vekirin û ez hatim.
Hesinkerê Kulek li baskên wê siwar bû û got:
- Wan seriyan bidin min. Wan seriyên zeriyan...
Serî dan wî û kevok firiya.
Serkumikê Berz li bexçeyê seraya Siltên, derket pêjiya yê
Hesinker û kevoka spî. Gava Serkumikê Berz Hesinkerê Ku-
236
Iek î Rîhsor dît, ew bi derbekê re nas kir. Tijtek di vêya de
hebû, lê çi bû. Tew yê Hesinker li pijta kevokê siwar bûbû û
hatibû.
Hesinkerê Kulek got:
- Ez ê Siltên bibînim.
Hesinkerê Kulek berdilka xwe ya sor kiribû ala û li ser baskê
kevokê hildabû. Û berdilka sor li vê dinyayê, wek alayeke
hêviyê ya herî muhtejem, germ û xweşik li ba dibû.
Serkumikê Berzê ku tavilê ji ba Siltên vegeriya, got:

- Kerem bikin, werin serayê. Siltan dê we qebûl bike.
Gêrîkê Kulek got:
- Em nikarin têkevin hundur, bila ew derkeve derve.
Gêrîkê Kulek ditirsiya ku li hundur dikarîbû tijtek bihata
serê wî.
Serkumikê Berz ket hundurê serayê û rewj bi temamî ji
Silrên re got. Siltan hêdî hêdî keniya, kêfa xwe anî û derket
derve.
Hesinkerê Kulek bi dengekî bilind got:
- Ez biryara gêrîkan digihînim te, hey Siltano!
Siltan keniya û ji Hesinkerê Kulek ê li ser pijta kevokê bû
re got:
-BibêjelTukîyî?
Gêrîkê Kulek got:
- Ez Hesinkerê Kulek im. Me ji îro û pê ve, serxwebûna
xwe îlan kir. Me hemû welatên gêrîkan biryar da ku êdî tu
gêrîk dê ne ji te re û ne ji fîlan re û ne jî ji hudhudan re bixebite.
Welarên gêrîkan ên gêrîkan in û em azad û serbixwe
ne.
Siltanê Fîlan pirsî:
- Ma hûn li vêya pir baj fikirîn?
Siltên hem dipirsî û hem jî dikir tîqe tîq, dûr û dirêj dikeniya.
237
Hesinkerê Kulek got.
- Em fikirîn. Gêrîkan ji te re diyariyek jî jand.
Siltên got:
- Diyariya wan çi ye, ka em bibînin.
Gava Siltên ev gotin digotin jî guhên wî yên wek merjan

bUind dibûn û pir dikeniya.
Hesinkerê Kulek got:
- Ji te re, Siltano! Ji te re, Siltano!
Berê serê Serokê gêrîkên zerî avêt ser çavên SUrên.
Bi dû wî re got:
- Ji te re, ji te re, ji te re!
0 hemû serên zeriyan avêtin.
- Te ev serî nas kirin, te nas kirin? Ji te re, ji te re, ji te re!
Gava Serkumikê Berz ji Siltên re got ku bê ev seriyên kê
ne, Siltan dîn bû, kefbi devê wî ket û got:
- Fîlên min, hudhudên min, lejkerên min biçin ser welatên
gêrîkan, ne kevir li ser kevirî û ne jî tu benderuhî bihêlin,
bi mejin!
Dengê wî ew qasî bi hêrs bû ku pijta çiyayan jî lerizî.
- Vî Kulekî jî tavilê bigirin û serê wî jê bikin.
Gava kevoka spî ev bihîst, wek gulê firiya çû. Ew hudhudên
ku baskên wan bez girtibû, dê çawa xwe bigîhanda vê
birûska spî?
- Bimejin, bimejin, bimejin!
Fîllejker jî li hember vê serîhildana gêrîkan pir hêrs bûbûn.
Ji nijka ve, rehetiya wan xera bûbû. Bi xezebeke bêsînor êrîjî
welarên gêrîkan kir, fîlê ku digîhajt wê derê, digot "guuurmv
û diket bin erdê... Fîlê ku digîhajt wê derê diket. Bi vî awayî,
hemû fîlên ku êrîjî welarên gêrîkan kir, di demeke kurt de,
ketin bin erda ku gêrîkan kolabû.
Gava Serkumikê Berz xebera vê rêkçûna mezin, vê rastiya
ecêb a ku hemû fîl ji ortê rabûbûn, gîhand Siltên, Siltan ji
238

ber êj û hêrsa ku vê xebera jê nayê bawerkirin pê re çêkiribû, bi qasî bejna mirovekî hilor bû û ket erdê. Carekê dît ku erd ji zelzeleyê jî bêtir diheje. Hîn digot, ev çi hal e, carekê dît ku axa devera ku ew li ser in jî diçe xwarê. Erd bi carekê veqelijî, seray jî bexçe jî û Siltanê Fîlan jî dabelihandin. Gava gêrîkan binên welatan kolabûn, binê seraya Siltên jî ji bîr nekiribû. Dersa ku divê ji vê bûyerê bête wergirtin, ev e ku gava hemû gêrîkên dinyayê bibin yek...

239

"Em ê dibistanên ku gêrîkan dikin fil vekin. Gava çêlikên gêrîkan hîn nuh çêdibin, em ê wan bînin li van dibistanan perwerde bikin. Ew gêrîk bin jî ew ê xwe rii bihesibînin û ew ê ji filan bêar bi Pilînyê ve bên girêdan. Bi sedan salan e ku li Mirovistanê, ev sîstema perwerdekirinê tê meşandin. Ew ê bibin fil û xwe pil bihesibînin, Lêew ê qet ji bîr nekin ku ew fîlên bi qasî gêrîkan in."

Ji romanê

**

SIVÊTLANA

Roman

Hesen Îbrahîm

_ 1 _

Mosko...

Sal: 1990 . heyv: Kanûna êkêye.

Roj: 31 heyvêye.

Dem: Nîv şeve. Çend çirkeyên mayn bo sala nû.

Cih: Kulaneka tarî û hejara mosko ye.

Befir tijî cadêye, serma dizekê birsîye.

Zengînên mosko, yên li senterê bajêrî kombûyn. Li hîvîya wan çend çirkeyên ji sala nihu ,mayn, da tijî esmanan agirê yarîyên rengîn bikin.

hejar, yên li kulanên sar û tarî, wan çirkeya dihijmêrin. Li hîvîya sala nû, da nan û hîvîya li gel xwe bibînit!

Du serxoşen tijî berçêlkên wan votkaya erzan, yen li serê wê kulana tarî, li hîvîya nêçîreka lawaz û gêj.

Şev binîvî bû. Gelek denga pêkve çirkeyên ji sala nihu mayîn, hijmartin.

Deh— Neh heşt.. hefit. Şeş.. Pêniç.. Çar.. Sê.. Du.. Êk.

Çavên cîhanê bi esmanave zîq bûn.

esman tijî pelên agirê yarîyên ciwan û rengîn bû.

Wek xifşa xezaleka kûvî, befira kulanê şeqand. Qesta cihê yarîyên agirî kir.

Li serê kulaneka tarî, diwa milên wê girtin.

Berî şazde salîya xwe pîroz bikit. Pişta wê danane ser befira tezî.

Qêrîyên wê li gel teqîna yarîyên serê salê ber bi esmanan bilind bûn!!

_ 2 _

Mosko...

Sal: 1991 heyv: Îlone.

Roj: 30 heyvêye.

Dem: Nîv şeve.

Cih: Xestexaneka mosko ya zaro bûnêye.

Zengîn û hejarên mosko, yên li hîvîya qêrîyên jinên xwe, da dengê girîya zaroyekî jîyana wan aloztir bikit.

Xifşa xezalê, li ser textê zarobûnê, bitine di nav xwh û janan da digevzit.

Kes li tana wê nahêt. Kes li hindav serî nîne. Çu bab li hîvîya mizgînîyê nebûn.

Şev ber bi dawîyê çû, jan zêde bûn, xwhê leşe wê terkir.

Dû sistira, destên wê baş şidandin.

Biqêrîyeka zarokînî, tijî pêsîra wê goşt û xwîn bû.

Piştî çend çirkeyekan, zaroyek, dinav hindek patên spî da, danane

ser sîngê wê yê şazde salî.

Daxwaza navekî bo kirin.

Bibişkurîneka zarokînî got:

_ navê wê sivêtlana ye..

_ 3 _

Mosko...

Sal: 2006 heyv: Îlone.

Roj: 30 heyvêye.

Dem: Nîv şeve.

Cih: Dîskoyeka erzan û kevnara moskoye.

Bi bîrewerîya pazdesalîya jidaykbûna sivêtlanayê, hevalên wê ya mêvan kirîye wê dîskoya kevnar.

Dîsko pire ji mêvanan. Cihê teng, dengê bilind. Berçêlkên vala. Piştî demekî kêm, berçêlkên hemûyan tijî votka erzan bûn.

Mejî alozkirin, hest jikar êxistin.

Leşen lawaz, li ber mozîka bîyanî xaf dibûn, xwe hejandin. Bêy hest bi awaz û selîqê bikin.

hevala palek pê ranan, havêtine ser depê dîskoyê.

Dest bo qutan, navê wê înan.

Sivêtlana. Sivêtlana. Sivêtlana.

ew votkaya li ser mejyê wê zal bûy. Li gel xwîna dilê wê têkel bû. Gehên leşe we harkirin.

Li gel destqutana hevalan û awazên bilindên mozîka bîyanî bilind bûne ber esmanan.

ew leşe pazdesalî, ew sîngê nîv rûs hejand.

hemû harkirin, hemû bi leşe xwe yê mê û bi sîngê xwe yê wek hêkên kewa ve girêdan.

Çend mêvanên dîskoyê li dor xwe komkirin. Destqutan û mozîk bilind bûn.

Nêçîrvanê birsî û herzekaran, simbêlên xwe bi hindek wêskîyê terkirin û du sê caran werbadan.

Jinîv şev û pêda. Kartêkirina votkaya erzan, li ser mejyê hemûyan dijwar bû.

hind bûne kelex ketin berpîyan, hind dikoşa hevalên xweda nivîstin,hind li ser mêzên vexwarinê dixew çûn.

Li berê spêdê, gilopên dîskoyê vemirandin. Neçarbûn, kitkte dîskoyê bihêlin, ber bi malên xwe yên sar biçin.

Destekî milê sivêtlanayê girt.

_ were, date bigehînime mal.

Neşîya bersiva wî bidit. Nezanî kî bû? Nezanî kîve bir?

hind ageh ji xwe bû. Ya dibin kelexê nêrekerekî da.

Destên wê hişik girêdan, pêt wê jêkvekirin. Cilkên wê diberda dirandin.

Dusê caran, destê xwe dinav pêsîra wêra bir ü înan.Destê dî havête memkên wê yên biçûk.

Devê xwe yê tijî wêskî, havête serê memkên wê. Memik hemû çû didevî da.

Bêna wî teng bû. Xwe havête ser sîngê wê. Xwe dinav pêsîra wê da

givaşt.

Qêrîyên wê tijî guhên nîveka xelkê moskoyê bûn.

Sivêtlana, çend rojeka bû mêvanê wî nêçîrvanê pîr!

4

Mîyunix...

Sal: 2007 . heyv: Sibate.

Roj: 13 heyvêye.

Dem: Nîv şeveka sare.

Cih: Kempeka penaberaye.

ew demek dirêj bû, wek nêçîrvanan bûseya xwe li berdana bû. Çavên wan ketin êk.

_ te cigarek heye?

Tijî dêmê wî bişkurîn û hîvî bûn.

_ erê, lê tinê êk cigareye .em disên pêkve bikêsin.

_ supas, başe.

Destê xu dirêj kir.

_ navê min sivêtlanaye.

Wî jî destê xwe kire dinav destê wê da.

_ elêkis.

_ xoşhalim.

Li ber dîwarê kempê rûniştin. Cigara xwe berdayê. Du cara dûkêla cigarê kêşa nav sîhên xwe. Binê wê kire dinav lêvên wê yên sor û nazik da.

Wê jî tijî sîhên xwe dûkêl kir, bikenîyeka zarokînî got:

_ supas.

Agirê cigarê dijwar bû, ^ê cigarê her zû kire xulî. Du sê caran, qopkê cigarê mêt û dana bin pê xwe û pirçiqand.

_ eve me têr nakit..

Bikenîyeka mê got:

_ raste..

Dest da berîka penteronê xwe, du sê caran li dor xwe zivirî, kes nedît.

Pirteka kaxezê ji berîka xwe Ina der. Kaxez vekir, du hepkên biçûk û gewir înane der. Bilez êk havête bin ezmanê xwe û yadî kire dinav lêvên sivêtlanayê ra..

_ eve çîye?

_ hişiş.. Ne axive ,eve dê te bite ber perên esmanan. Dê te kite şahejin.

Devê xwe yê biçûk vekir, hepik dana bin ezmanê xwe, dinav devê xweda hepik mêt.

hêdî hêdî, gehên wê xav bûn. Dengê wê bilind bû, kenî, yarî bitilên wî kirin.

Piştî demek! kêm, xwe dibin hevalê xweve rûs dît.

Nevîya ji bin hevalê xwe bête der, xwe dinav sîngê wî yê rûs da

şidand.

Dengê wê yê xav, ji kûratîya dilê wê dihat:

_ te çi kir.?

Bêy xwe têk bidit:

_ niza!

_ pa heker ez aviz bûm?

Serê wî ev gotine wergirt..

_ aviz?! Aviza çi?!

Bêy xwe ji sîngê wî vekit:

_ te ez gam bêy (kondom) û bêy çu rêgir. ez dê aviz bim. ez kiçim ne wek te zelamim?

hêşta bawer ne dikir, destê xwe bi pirça wê da bire xwar:

_ niza.! Divêt em xwe bigirin, ka dê çi bit.

_ em dê xwe girin, lê jibîr neke, tu babê wî, xwe berzeneke. _ ez jite dûr nakevim heta mirinê..

Şidandina wan zêde bû, şerâ evînê berdewam bû.

5

Nürnbêrg...

Sal: 2008 heyv: Mijdare.

Roj: 10 heyvêye.

Dem: Berê spêdêye.

Cih: Xestexana zarokbûnêye li nürnbêrg.

Sivêtlana ya li ser textê zarokbûnê dinav xwh û janan da dikite hewar.

elêkis, yê li hindav serî, li hîvîya dengê girîya zarokê xwe.

Sistirekê, destên wê girtin, dixiturî serê xwe kire dinav lingên wê da.

Biqêrîyeka zarokîn, tijî navçavên elêkis hîvî kirin.

Dengê girîya zaroy tijî jorê bû. elêkis li hindav serî rawestîya. Tila xwe ya biçûk kire didestî da.

Sivêtlanayê awrîek dayê.

_ saşa. Navê wî saşaye.

Tijî dêmê elêkis bişkurîn bû.

_ 6 _

Nürnbêrg...

Sal: 2009 heyv: Çileye.

Roj: 15 heyvêye.

Dem: Nîv şeve.

Cih: Baxçeyekê giştîye.

Befir tijî hemû cihaye. Serma wek tarîyê tijî çavên mirovî dibit. Cihê rûimtinê nîne. Baxçe wek wêneyekê fotografî xûya dikit. Li bin dareka tijî ser befir, destê wê girt, kêşa nik xweve.

Xwe asê kir, dûr ket.

_ çîye? Tu ji min di tirsî?

Xwe kire qormik, dinav tarîyê da berzebû.

_ ez ji hemû nêra di tirsim.

Kenî, divîya xwe xwîn şirîn bikit..

_ ji min jî?!

_ tu jî wek hemûyan nêrî.

_ ez ji dil hez jite dikim!

_ hemû we dibêjin.

_ ez newek kesê me.

_ te jî wek wan ez ji bo ganê divêm..

Bawer ne dikir dê vê axivtinê ji wê guh lê bit. Divîya tirsa wê sist bikit.

_ nene, wenîne. Gan ne hemû tişte.

Pişta xwe dayê.

_ eve rastîye.

Divîya pitir kehî bikit.

_ ma te gan nevên?!

Bêy berê xwe bidite navçavên wî. Çend gaveka dûr ket.

_ min digel wî divên ewê jidil ez divêm. Ne tinê jibo gan û dem borandinê.

_ min jidil tu divêy, bawer bike.

_ wenîne ,ez bawernakim. Te tinê ji bo gana ez divêm û..

_ bibore, sivêtlana we ne bêje. Jinên gana tijî kulanên bajêrîne. Min tu wek heval divêy, bawer bike...

Bi du çavên zîq û pir goman berê xwe da enîya wî. Divîya bawer bikit, neşîya.

Xwe nêzîk kir, destê wê girt û keşa bersîngê xwe.

Du maç li enîya wê dan.

_ ji min netirse ,ez çu karên ne bi dilê te digel te nakim.

ev kare, karekî hevbeşe, divêt bi dilê herdu layena bit, da hest bi xoşyê bihête kirin.

Berê xwe da devê wî. Bê deng ma.

Divîya hêsta dinav sîngê xweda bihêlit..

_ min divêt biçime mal..

_ bila, lê..

_ lê çi? hêsta te çu digel min ne kirîye?

_ nene ,em nihu yên hatîn, hêsta zûye..

_ ez ditirsim.. ez ji tarîyê ditirsim. ez ji nêra di tirsim..!

Givaşte ber sîngê xwe.

_ netirse, tu ya di nav sîngê min da.

_ ez ji sîngê te ditirsim. Ji germa ^ê te ditirsim, ji çavên te yên nêr ditirsim..

_ soz bit, ez bêy dilê te, te maç nekim.

_ bibore ,ez bawer ji çu nêra nakim. Min bigehîne mal.

7

Nürnbêrg...

Sal: 2009 heyv: Adare.

Roj: 10 heyvêye.

Dem: Direngî sevêye.

Cih: Cihê jivanên wî ye.

Tirumbêla xwe li beranberî (makdonalsê) li cihê jivanî rawistand.

Derê bitlekê avê vekir, du sê fir lê dan. Çavên wî mane li bejna her jinek, her mirovek. Wê nîv sevê li wan dora dîyar di bit.

her çendekê berê xwe dida telefona xwe ya berükê. Ka çi deme? Ka kesê telefona wî nekrîye?

Cih tarî û bê denge ,her deh xulekan, tirênek dihête wîstgehê. E

hindek kes peya dibin û cihî tijî deng dikin.

Lê her zû hemû berze dibin û cih şir dibit..

Ji tirsa xewa wî bihêt. Kasêta tirumbêlê hilkir.

Stirana mihemed Şêxo, ay felek. Xewa wî pitir îna.

Dergehê tirumbêlê vekir, xwe havête der. Qesta pişt dîwarekê tarî kir û mîst. Dengê şirka mîza wî, hizirên wî sil kirin.

Tijî hinavên wî bayê sar bû. Şa^n ^ê wî hişîyar bûn.

Jitirsa êk wê nîv şevê bibînit, qesta tirumbêla xwe kir.

Li cihê xwe rûnişt, dergeh girt, mejîyê xwe givaşt..

_ heker hat. Dê çi kim? Dê çewa peşwazîya wê kim? Dê çi bêjimê?

Li pişt xwe zivirî. Tirumbêla wî ya mezne ,heşt kursîke. Kursîk wek textekî dihêne çemandin. Mirov dişet li ser binivit.

Ji cihê xwe hate der. Dergehê nîvê vekir. Kursîkên nîvê çemandin. Wek textekî lê kirin.

_ em dê şên li ser vî textî hemû kara bikîn. erê, em dê li vêrê bine bûk û zava.

Tijî navçava bişkurîn bû.

hate bîra wî,dema cara êkê li ser vî textî digel wê kiça çîkî nivîsitî..

Kiçeka nazik û çav şîn. Li wîstgeha pasê dît bû.

Bi çavên tijî nêratî silav kirê. Kiç li hîvîya silava wî bû..

_ tu ya bitinêy?

_ erê..

_ li hîvîya kêy?

_ li hîvîya te.

Kenî. Kenîya wê bersiva pirsîyarên wî didan.

Milê wê girt û qesta tirumbêla xwe kir. Kiçê xwe havête têda û bi lez hajot..

_ dê kîve çî?

_ bikeyfa teye..

_ mala te li kîveye? Da te bigehînime mal.

Bikenîyeka şirîn.

_ mala min ya li wî cihê te ez jê înaym.. herdu pêkive ji dil kenîn.

Zanî, nêçîra wî ya vê carê, bi dilê wî ye.

_ te kîve bibim?

_ min got bi keyfa teye..

_ heker bi keyfa min bit, dê te kime didilê xwe da.

Bi kenîyeka mê..

_ ma dê cihê min didilê te dakit? Wek ez dibinim tu xudan jin û zaroy.

Çavên xwe li wan kursîka gêra, kursîka zaroyê wî yê biçûk kete ber çava.

_ cihê te dê yê taybet bit di dilê min da, xema wan nexu.

Tirumbêl ji bajêrî dûr ket, ji cadê der ket.

Li parkekê tijî darubar, li cihekê dûr ji çavan. Tirumbêla xwe rawistand.

Baran dibarî, dinîya sarbû, cih yê vala bû.

Xwe ji tirumbêlê havête der. Dergehê nîvê yê tirumbêlê vekir. Kursîk vekirin, serên wan gehandine êk.Textekî dumêre dirust kir. Mêvana wî bi çavên mê berê xwe dida karê wî.

_ te çi li bere?

_ were vêrê..

_ cihê min xoşe.

_ were, ne tirse.

Kenîya wê, gehên leşe wî har kirin.

_ ez natirsim.

Xwe ji tirumbêlê havête der û hate birex wî ve.

_ iha eve ez hatim.

_ tu li ser serê min hatî. eve mala meye .eve jora nivîstina meye. Mane bi dilê teye?

_ belê bi dilê mine, birastî wek jorekê ye ü hêşta xoştire.

Destê wê girt, xwe nêzîk kir. Pirça wê bitilên xwe şekirin. Destê xwe bire xwarê, benduşka sîngê wê vekir. Destê xwe bire nav memka.

Devê xu havête devê wê û jidil mêt.

Kiç di nav destan da bû yarîyeka bê gîyan.

Piştî demekî kêm, kiçê rûs xwe dibin ve dît.

Ji wê rojê, her çend rojekan, ew kiç yan her nêçîreka dikete destan. Li wî cihî û li ser wî textî dikire mêvan.!

Kenîya hindek kiçan, hizirên wî cemandin.

_ eve nehat.! Gîrû bû.

Dergehê tirumbêlê girt, li ber lêva cadê pîyase kir. Çavên wî wek zêrevana, hemû livîn tomar dikirin.

_ nehat.

Dest da telefona xwe ya berîkê, çavê wî bi demî ket. Xûya bû eve pitir ji demjimêrekêye li hîvîya wê.

Neşîya xwe pitir bi girt.Telefon bo kir.Bersiv neda, bêhna wî teng bû.

Qesta wî dîwarê berî çend xuleka li pişt mîstî kir. Carekadî mîst.

Li dor xwe zivirî kes nedît. Ji dil ture bû. Qesta tirumbêlê kir. Li cihê xu rûnişt. Dest da qodîkeka bîrê û vekir. Dû fir lêdan, qodîk dana, pakîteka cigara vekir. Cigarek berdayê.

Du miz lêdan û cigare havête ji derve. Zivirî qodîka bîrê, tijî devê xwe bîre kir.

Berî bête vî jivanî, li panzînxanekê, şeş qodîkên bîrê û du pakîtên cigarên marlboro kirîn.

Sivêtlana gelek hez ji vî corê bîrê dikit û gelek ya cigar kêşe.

_ eve nehat.?

_ bo gîru bo?

_ dê her hêt. Ya gotî dê hêm.

_ erê, dê hêt û dê dirêj kime ser vî textî. Berî dirêj bikime ser textî, dê devê xwe havême lêva wê ya binî. Dê jurda bime xwarê, dê bendoşka sîngê wê vekim, dê memkên wê kime didevê xwe da.

erê, memkên wê di biçûkin, hemû diçine di devê min da.

Dê hêdî hêdî, dirêjikme ser vî textî û dê rûs kim.

Dê xwe havême ser sîngê wê yê zarokînî.

Dê jidil gr^şme ber sîngê xwe,.. Dê.. Dê..

Dengê rêveçûna mirovekî, sivêtlana jinav hizirên wî dizî.

Li ser milê xu zivirî, bejna sivêtlanayê yakin û seruberê wê yê zarokînî dîyar bû.

Destên xwe yên havêtîne şaxên paysklekê kevin û didite ber pala.

Xwe ji tirumbêlê havête der, qesta cihê wê kir. Li berahîya wê rawistîya.

Sivêtlana, jinav hizira derket. Dema çavê wê vê ketî..

_ tu li vêrê çi dikî ?

Vê pirsîyarê serê wî pitir aloz kir.

_ ez yê li hîvîya te, ma te negot nihu ez dê hêm.?

_ min we got?! ha.. erê.. erê bibore.

_ eve pitir ji demjimêrekêye ,ez li hîvîya te.

_ bibore min kar dikir. ez neşîyam zûtir bêm.

_ xem nakit. Giring ewe tu hatî.

Kenîya wê ya zarokînî, rengê wê yê mê, wê şeva direng. Nezanî dê çi kit? Dê çi bêjitê.?

_ em çi bikin?

_ niza..

_ da biçine cihekî rûnin.

_ erê, ez gelek ya wastîyay me.

_ dê were tirumbêla min ya li rexê dî.

_ û vî paysklî? em dê çi lê kin?

_ digel xwe bîne. Tirumbêl ya mezne. Dê cihê wî hebit.

Dergehê tirumbêlê vekir. ew textê bo nêçîra xwe veday, payskil dana ser wî cihî.

Cih teng bû, zanî, vê carê neşet çu nêçîra bikit. Zanî, payskilî cihê wî girt.

Xwe havête dinav tirumbêlê da, sivêtlana birexive rûnişt.

Berî tirumbêlê bidite karî, dest da qodîkeka bîrê vekir ü kire di destê sivêtlanayê da. Û ew pakîta cigaran jî ewa bo xwe vekirî, cigarek jê îna der û bo berdayê.

Devê wê beş bû, wastîyana wê verevî.

_ oh. eve geleke. Supas.. Gelek supas. Pêdivî vê hemûyê nebû. ez jidil supasîya te dikim.

Devê xwe yê ter ji bîrê, havête devê wî yê hişik û maç kir. Bi lez berda.

Tijî dêmê wî hîvî bû. Jiber dengê qotana dilê xwe, nezanî çewa tirumbêlê di hajot.

Berî sivêtlana bêt, diserê xweda pilanek danabû, kadê çi kit. Û kadê kîve bit.

Berê tirumbêlê da cihê diserî da. Lez dikir. her çendekê, tijî çavên xwe dêmê wê yê zarokînî û wastîyay dikir.

ew ya mijûl bû bibîre û cigara xweve.

Wê jî her çendekê, kenîyeka şirîn bo dikire dîyarî.

Rêya wî kurt dikir. Qotana dilê wî zêde dikir. Bezîna tirumbêla wî zêde dikir.

Li ber lêva baxçeyekê mezin, li cihekê dûr ji hatinuçûnê. Dinav daristaneka tarî da. Tirumbêl rawistand.

Şev û li cihekî tarî û dûr. Digel kesekî bîyanî û leşe wasitîyay.

Zanî merema wî çîye.

Cih bê deng bû. Berê xwe dane navçavên êk. Bişkurîna lêvên wê, xwîna dilê wî kire volkan.

Destê xwe dirêj kire rûyên wê, perxandin.

_ çi bikin?! Biçine derê, yan dinav tirumbêlê dabin?

Çavên xwe ji çavên wî venekirin.

_ bi keyfa teye..

Kenî.. Kenîya wê ji dilekê sade û bê tirs dihat.

Gehên nêratîya wî har kirin.

_ da biçine derê. Dibit dinav vê daristanê da hindek kursîk hebin em li ser rûnin.

Dergeh vekir, berî wî xwe havête der. Li berahîya wî qesta daristanê kir.

ew jî derket, li dor xwe zivirî, kes nedît. Piştrast bû.

Gehişte birex sivêtlanayê ve, destê wê girt ü perxand. Bêhna wî nehat. Destê xwe dana ser milî, bêhna wî nehat. Keşa ber sîngê xwe.

Çavên wan ketin êk. Neşîya xwe pitir bigirt.

Devê xwe havête devê wê, lêvên wê ji dil mêtin.

ew ya bi lez bû, lêvên xwe jinav lêvên wî înane der. Bikenîyeka

• A .

şirin got:

_ bibore, min nedivîya tu we bikî..

Şerim jixwe kir. Milên wê girtin..

_ bibore, min neşîya xwe, te ez har kirim..

herdu bê deng bûn. Wî dlviya wê bikeşte cihekê tarî û dûr jiçavan. Wê divîya wî li cihekê ron û dîyar rûnin.

Milê wê girt, bire dibin dareka mezin û tarî ve. Çeqên wê şor bibûne erdî. Wek reşmaleka qereçî erd tarî kir bû.

Wê zanî, heker çu bin vê darê ve. Dê pişta wê kevte erdî.

_ bibore ,ez ji tarîyê ditirsim..

_ tirs? ez yê digel te. Netirse.!

_ ez ji te ditirsim.

_ ji min?! Bo ji min ditirsî?

_ min nevêt çu karên sêksî digel te bikim.

_ min ne gotîye te da karekê sêksî bikin!

_ erê lê.

_ lê çi?

_ pa bo dê min kîye dinav vê dara tarî da?

_ eve cihekê romansîye, kes me nabînit. em dê bi dilê xwe axivin.

_ nîv şeve, kes li vara nîne me bibînit.

_ bila, da em piştrast bin. Da bişêm têr te bidime ber sîngê xwe.

_ ne, bibore. Da bizivirine tirumbêlê..

_ bi keyfa teye.

herdu bê deng bûn. Nedivîyan çavên wan bikeve êk.

_ çîye? Tu ture bûy?

Bêy berê xwe bidite navçavên wê..

_ ne.

_ belê, wesa dîyare. Tu yê turey.

Li cihê xwe rawistîya.

_ ma ez yê neheqim?!

Kete ber sîngî.

_ bibore dilê min, min nevêt tu bi çavên leşfiroşan berê xu bidîe min. ez, ne...

_ bibore sivêtlana. ez baş cihê leşfiroşan dizanim. Û ez te jî baş dinîyasim. Min tu divêy. Min hevalînîya te divêt.

_ erê, lê eve tinê çend carekin em pêkive derdikevin. em baş êk nanîyasin.

_ raste, lê ez neşêm li ber sîngê te, li ber çavên te xwe bigirim. Bibore.

Bikenîyeka şirin, destê wî girt û da bersîngê xwe yê biçûk.

Devê xwe havête devê wî û jidil mêt.

_ bêhna xwe fireh bike .ez narevim.

Tijî dêmê wî hîvî bû. Lê nevîya enîya xwe ya girê vekit. Li hîvîya xelatekê mezntir bû.

Dergehê tirumbêlê vekir. Sivêtlana rûnişte cihê xwe, pişta xwe da kursîkê. Qodîkeka bîrê vekir. Qodîk da ser devê xwe, pitir ji nîva qodîkê berda gewrîya xwe. Tijî çava ronidik bûn.

Cigarek berdayê. Berî wê dûkêla di devê xweda berdit..

_ bibore ,ez ^êm ditirumbêlê da cigarê bikêşim? ez dizanim tu cigara nakêşî.

Bêy lê bizifirt, bêy çavên xwe ji pençera rexê xwe vekit..

_ tu dişêy.

_ tu ture bûy?

_ nexêr..

_ belê, ji enîyate dîyare..

_ ma bote xeme?!

_ erê bo min xemeka girane.

Berê xwe da navçavên wê yên tijî xew.

_ ez bawer nakim.

Xwe havête dikuşa wî da, devê xwe havête devê wî, lêvên wî bi hemû hêza xwe mêtin.

Xwe dinav sîngê wî da û şidand.

_ bibore ,ez neşêm digel te binivim. ez neşêm ji van maçan pitir bidime te.

Min hevalek yê hey, ez jidil hez jê dikim.

Dengê hajotinê ji tirumbêlê hat. Nezanî çewa dihajot. Nedizanî kîve diçit. hind ageh ji xwe bû. Li ber derê mala wê tirumbêl rawistand. Sivêtlanayê maçeka bi lez dayê û derket..!

Nürnberg...

Sal: 2009 heyv: Tîrmeh.

Roj: 15 heyvê ye.

Dem: Nîv şeveka havînî ye.

Cih: Jora sivêtlanayê ya nivîstinê ye.

_ xwe dirêj bike..

_ bibore?!

_ min got, xwe dirêj bike, were birex min ve.

_ tu gelek yê bi lezî.

_ ez har bûm.

_ eve min gelek caran gote te ,ez ne leşfiroşim. Û mala min ne cobexaneye.

_ min jî gelek caran gote te .ez baş cihê leşfiroşan û cobexanê dikevim û ez li leşfiroşan nagerim. Min tu divêy.. Tinê tu.

ew çend roj bûn, kar bo vî jivanî dikir. Gelek telefon, gelek jivan.

heta şîyay sivêtlanayê razî bikit. Jivanê vê carê li mala wê bit.

Mala sivêtlanayê, gelek biçûk û nelêkday ye.

Du jorên valane. Tinê li jora nivîstinê, textekî du mêre yê danaye. Sivêtlanayê, berê wî da jora xwarinê.

Avek dayê, hindek suhbet bo kirin.

ew yê bi lez bû, rabû ser xwe, li mala wê gerîya. heta cihê nêçîra xwe dîtî. Li ser textê wê yê nivîstinê xwe dirêj kir.

Piştî gîrû bûy, sivêtlanayê da dûv. Li hindav serî rawestîya.

_ were birex min ve.

Destê xwe bo dirêj kir.

Sivêtlana neçar bû, rûnişte birex ve li ser textê xwe yê nivîstinê. Destê wê girt û perxand.

Du maç li nîva destê wê yê biçûk dan.

Xav bû, çavên xwe neqandin. Bi destê dî, qimçika kirasê wê vekir. Destê wî neçu jor.

Çend qimçikên dî jî vekirin.

Sîngê wê yê spî diyar bû.

Neşîya xwe pitir bigirt. Devê xwe havête bişkujka memkê wê û jidil mêt.

Sivêtlana dinav destanda bû yarîyeka patey.

Kitkite, cilkên wê jiber kirin. Wek biçûkeka sava dinav destan da xûya dikir.

Leşê wê yê zarokînî, spî û nazik. Dirêj kire ser textê wê yê nivîstinê.

Gelek li hindav serî ma. Tijî çavên xwe ew dîmen kir. Bi destên xwe, bi ezmanê xwe. Gelel ew ^ê mê vemalî.

Nezanî dê çewa dest bişerî kit. Nezanî dê çi kit?

Sivêtlanayê hest bi mendeheoşîya wî kir.

K^şa ber singê xwe yê har. Jidil şerâ evîneka dijwar destpêkir.

Piştî herdwa ala bilind kirin. jor bê deng bû, xewê dil û leş dagîr kirin..

_ tu dizani, tu mêrê sîêy digel min dinivi ?!

_ tu dizani, tu jina duyê ez digel dinivim ?!

_ ez bawer nakim..

_ bawer bike.

_ tu jin perêsî..

Rabû ser xwe, xwe havête ser singê wê yê rûs. Devê xwe havête lêva wê ya bini.

_ ez sivêtlana perêsim..

Keni, keniya wê awazên evineka dijwar jê bilind bûn.

Dest bi şereke dî kirin. Vê carê, şerê wan gelek dijwartir bû. Careka dî, alayên a§tiyê bilind kirin.

_ bibore ,ez neşem digel te hosa binivim. Min hevalek yê hey, ez jidil hez jê dikim. em dê bine jin ü mêr, dê bi dirusti digel min jit. Vêca bibore.

_ kiçê ew ji yariya bite dikit, wek yê di.

_ nene ,ew ji dil hez ji min dikit.

_ kes hindi min hez ji te nakit.

_ tinê ji bo nav nivina.

Keniya wê vê carê, awazên bê omêdiyê jê dihatin.

_ ne, wenine .eve çende em êk diniyasin? eve çend care em pêkive derdikevin?

Tinê vê carê em digel êk nivistin..

_ û cara dawyêye.

Rabû ser xwe, lêva lihêfê bilind kir. Destê xwe havête memkên wê û perxandin.

_ ne bextê teda, weneke. Piştî min ev memke û ev leşe nazik dîtî, min nehêle .ez dê dîn û har bim. ez neşem jite dûr kevim, min nekuje, min neke êxsîrê van çavan, min...

_ min gote te ,ez ya bi hevalim û ew ji dil hez ji min dikit. Min jî ew divêt, min jî divêt bibime xudan mal û mêr û...

_ ez jî ji dil hez ji te dikim, ez jî pêdivî teme..

_ dibit, lê tu xudan jin û biçûkî. Te demê min nîne. Tinê dema dilê te diçite min. Tu telefona min dikî.

_ wesa hizir neke .hemû dema dilê min diçite te. Tu ji peş çavên min naçî.

_ û jin û biçûkên te?

_ ew nabine asteng dirêya evîna me da.

_ bibore ,ez neşem wek leşfiroşan bijîm.

_ min wene got.. Min..

_ ez neşem digel du mêra bijîm.

_ wî bihêle .ez û tu dê pêkive jîn.

Berê xwe da navçavên wî, amajeyên aşkira yên direwan têda xwandin..

Jor bê deng bû, her êk dinav hizirên xweda berze bû.

Telefona wî ya berîkê lêda.. helo?

_ helo bab, ma tu na êye mal?

_ belê, eve ez hatim.

Sivêtlanayê serê xwe bilind kir. Bersiva gomanên wê hate dan.

_ dê hosa digel min jî?!

Nevîya çavên wî bikevne çavên wê.

_ kî bû? Kurê tebû, mane?

Bi dengekê bê omêd.

_ erê.. Kurê min bû.

Sivêtlana, rûs jiber tenişta wî rabû, qesta sersûyê kir. Li ber derî gotê..

_ hilo, here mala xwe, jinate û biçûkên te yên li hîvîyate.

9

Nürnbêrg...

Sal: 2009 heyv: Tebaxe Roj: 11 heyvêye.

Dem: Spêdeyeka zûye.

Cih: Jora dadgeha xêzanîye.

Li pişt mêzeka mezin, dadwerekê sere yê rûniştîye. Tijî ser mêza li ber sîngê wî, kaxez û ektene.

Li destê çepê yê dadwerî. Mêrê wê, babê kurê wê, digel parêzerekî tijî di dest da kaxezin. Bi rex wan ve, xesûya wê digel xezûrê wê diamadene.

Li destê dadwerî yê rastê, sivêtlana, li ber tenişta parêzerê xwe wek pepûka rawestîyay bû.

hemû li hîvîya birîyara dadwerî bûn.

Dadwerî serê xu jinav wan kaxez û ekta îna der. Berê xwe da bejna wê ya zarokînî.

Wek biçûkek deh diwazde salî hate pêş çavan.

_ tu neşêy biçûkê xwe saşay xudan bikî.

Tu ya fêrî vexwarinên kiholî bûy. Tu ya fêrî kêşana dermanka bûy. Tu hêşta wek biçûkekî hizir dikî.

Çavên sivêtlanayê, wek sivorekê tirsinok, di serî da zîq bûn.

Berê xwe da parêzerê xwe, daxwaza harîkarîyê jê kir.

Berê xweda mêrê xwe, divîya hîvîya jê bikit.

Nîşaı^n serkeftinê tijî dêmê mêrî bibûn.

_ bibore dadwer. ev gotine nedidirustin. hemû direwin...

Dadwerî hindek kaxez bilind kirin.

_ ev belge û dîdevan, wena bêjin.

Wek ektereka şanoyê, destên xwe bi sîngê xwe yê biçûk venan..

_ hemû direwin, bêbextîne .ez çu rengên kihulê venaxom. ez dermanka na kêşim. Tinê.. Tinê.. hindek caran, wek her kesekî, ez hindek bîrê vedxom.

Dadwer rabû, hemû rabûn.

_ biborin, bimînin li hîvîya birîyara me ya dawîyê.

Li pişt dergehê jora dadgehê, hemû man li hîvîya birîyara dadwerî.

Tijî dêmê sivêtlanayê û yê parêzerê wê tirs û goman bûn.

Jiwan wêve, mêrê wê û hevalên wî, nişanen serkeftinê û kenî û suhbet ji dêmên wan dibarî.

Dadwerî, hemû keşane jor.

Wek tîpeka honerî, hemûya milên xwe dane êk û mane li hîvîya birîyara dadwerî.

Dadwerî kaxezek bilind kir. Berê xwe da hemûyan.

_ birîyar.

Guhên sivêtlanayê vebûn. Lê jiber qotana dilê wê, dengê dadwerî baş nedigehşte guha..

_ piştî bo me dîyar bûy, bibelge ü dîdevan.

Sivêtlana neşet kurê xwe saşay xudan bikit.

Ji egera vexwarina kihulê û bikarînana dermankan û hevalînîya zelaman û bêkarîyê.

Me birîyar da, kurê wê saşay bidine babê wî, elêkis.

Wî bitinê maf heye kurê xwe xudan bikit.

Dîsa, me birîyar da, sivêtlana nabit bêy izna me biçite seredana kurê xwe.

herwesa, sivêtlana, ji wê mala berê ew têda dijîya bê bar bû.

Mal û biçûk bo elêkis mêrê wê yê berê û kurê wan man.

Rengê sivêtlanayê zer bû. Çavên wê tarî bûn. Devê wê hişik bû. Dadwerî kaxezer kire di dest da..

_ livêrê îmza bike. Te maf heye li birîyara me nerazî bibî. Û birêya parêzerê xwe daxwaza dubarekirina dadgehê bikî.

Lê heta wî demî, birîyara me bicih bine.. Keremke.

10

Nürnbêrg...

Sal: 2009 heyv: Tebaxe Roj: 15 heyvêye Dem: Nîv şeve Cih: Baxçeyekê giştîye.

Zenga telefona wê ya berükê lê da.

_ helo?

_ helo sivêtlana. Tu çewanî? Tu li kîvey?

Dengê girîyê ji axivtina wê dihat.

_ pirsîyaweka çivêle. Ma te divêt ez ya çewa bim?!

_ bibore, tu li kîvey?

_ niza.. Bawer bike ez nizanim li kîveme?!

_ sivêtlana, eve ez hatim, bêje tu li kîvey?!

_ tu xudan jin û biçûkî, barê te yê girane. Xwe ture neke ,ez ya fêrî van kolana û vî halî bûym.

_ bêje min tu li kîvey?

_ ez ya li baxçeyê giştî.

_ eve ez hatim. Te çi divêt digel xwe binim?

Bi keniyeka xav.

_ min mirovayeti divêt.

Wek gelek caran, li panzînxaneyekê.

Du pakitên cigara û çar qodikên birê û hindek (kondom) kirin û qesta baxçeyê giştî kir.

Li cihê jivanên wan yên gelek caran.

Sivêtlanayê ya xwe kirie qormik li ser textê dari.

Leşê wê yê biçûk, şeva tari, xem, birsê.wek biçûkekê diyar dikir.

Li hindav seri rawistiya.Sivêtlana ji nav xem û mandibûnê hişîyar kir.

Serê xwe bilind kir. Rengê dêmê wê beyana bêomêdyê digehand. Bêy rabite ser xwe, destê xwe dirêj kir.

_ bibore ,ez neşêm te maç bikim.

_ te xêre? Tu gelek ya wastiyay.

Giriyê ser ji axivtina wê stand.

_ ez ya birsi me .eve sê roje min têr nexwariye.

Dest da qodikeka bêrê û bo vekir.

_ hindek birê vexo, ez dê çim bo te xwarinê peyda kim.

_ vê nîv şevê xwarin peyda nabit.

_ belê (pitza) divekirine .eve ez çûm dê nihu zivirim.

Sivêtlana hêla digel qodîka bîrê û qesta wê xwaringeha gelek caran, (pîtza) jê dikirî kir.

Piştî demek! kurt. hat û tijî desta xwarine.

Sivêtlana rabû ser xwe, xwe havête dinav sîngê wî da û ji dil maçî kir.

_ supas, birastî tu mirovekê dil saxî. Ji dil ez supasîya te dikim. Xwarin vekir, dana ber sîngê wê.

_ bixu, heker te ji dil bivêt supasîya min bikî. Tu çucar xwe jimin dûr nakî. hosa xwe nahêlîye birsî û pêdvî. Ma te telefona min nebû?

Tijî devî xwarin bû.

_ bibore, min nevêt barê te giran bikim. ez dizanim tu xudan jin û biçûkî.

Divîya xemên wê sist bikit.

_ tu jî biçûkên minî..

Berî parîyê nanî bikite di devê xweda.

_ xuzî te bi wî çavî berê xwe daba min!

_ dê bixu, em dê gelek axivin.

Wek gîyanewereka birisî, pirtên (pîtzayê) didane ber leqan. her weku eve cara êkêye ,evê jinê nan dîtî.

ew bibû, wênegirekê şareza. Livîn û hestên wê tomar dikirin. Bîrewerîyên wî yên rojîn birsê, lê nû dikirin. Çend yê têr bû, hest bibirsê kir.

Sivêtlanayê, serê xwe bilind kir. Zanî yê livînên wê tomar dikit. Dest da pirteka pîtzayê û kire di devî da.

_ ha.. Tu jî hindekê bixu. eva geleke bo min bitine.

Devê xwe vekir, bitameka êkcar xoş, ew pirta pîtzayê didevê xwe da cî.

_ tu têr bûy?!

Tilên xwe alîstin..

_ bibore, min weku (sa) dixwar, mane?

_ tu biliblî, tu gulî tû.

Axiftina wî birî.

_ supas, ez baş dizanim ez çi me.

ZZ 1 • . • . • A •• A • A . • A •• A

_ ji bo min tu ciwantirin jin u şirıntırın jin u..

_ û bênamûstirîn jin û.

_ ne, wene bêje .heker tu carekadî van gotinan bêjî, ez têkilîya te nakim.

_ bibore, min nevêt tu wesa min binîyasî. ez ne leşfiroşim. ez ne jineka bê delingim.

_ hişbe ,eve min gelek caran gote te.

evê suhbetê neke .ez cihê leşfiroşan dizanim.

_ bibore, bibore. Min tu bitinê yê may, min çu heval nemayne.

her kesê roja êkê hevalînîya min kit. Ganek divêt. ez neşêm hevalînîya kesê bikim.

Rabû çû birexive rUnişt. Serê xwe dana ser milî.

_ bibore, min tu ture kirî, min kes nîne li vî welatî. ez ya mayme bê xudan. Li min ture nebe. Min nehêla bitinê.

_ ez te nahêlim. Lê tu jî soz bide vê axivtinê dubare nekî.

_ ez neşem soz bidim. Jiber ez nizanim tu bo hinde harî min dikî, tu xudan jin û biçûk û mal û ?!

_ jiber, ez ji dil hez ji te dikim.

Kenî, kena wê ya xav bû, her zû bû goman.

_ lê hosa bo min dest nadit. ez neşem hez ji mêrekî xudan jin bikim. Û wek min gotîye te ,ez jî hez ji mêrekî dî dikim. Dilê min yê li nik wî..

_ ka ew mêr?! Boçî li hindav serê te nîne?! Boçî li tana te nahêt?!

_ niza...! Min jî ew pirsîyar ji xwe dikir.

_ ew yarîya bite dikit. ew demê xwe digel te diborînit. Wî gelekên wek te hene. Bawerbike.

_ nene ,ez bawer nakim. em dê pêkive jîn. Bila ez jivan areşa xilas bim. em dê digel êk jîn.

_ û ez?!

_ tu xudan mal û jin û biçûkî. Dê her mînî wek heval.

Destê xwe dana ser serê wî.

_ supas bo harîkarîya te bo min kirî. Soz bit ez wan parên te dayne min bo te bizifirînim. Lê..

_ lê çi?! Bawer bike ez neşem byê te bijîm.

_ tinê ez bawer dikim, û bo me hosa dest nadit.

herdu bê deng bûn. Cih bû gorstan.

Firfira bîrê ji devê wê dihat. ew şeva tarî û ew bê dengî, bi gîyan dikirin.

_ te çi li bere?! Dê çi kî?!

Jinav bê dengyê derket. Berê xwe da navçavên wî bê omêdyê rengê wî zer kiribû.

Divîya bêjit, min ev pirsîyare ji bîr kirbû. Boçî te careka dî îna bîra min?!

_ niza! Min çu cih nînin lê bijîm. Min pare nînin pê bijîm. ez jî nizanim dê çi kim? Dê kîve çim?!

_ te digot, min hevalek yê hey. Pa ka..

Nehêla axivtina xu bi dawî bînit.

_ hevalê min mêvan yên heyn.

_ û ew hevala te ya okiranî?

_ mala wê gelek ya dûre ,ez neşem bi pîya biçim û min pare nînin telefona wê bikim. Û..

_ ez dê te bim, ez dê van areşa hemûya çareser kim. Xema nexo..

_ heta kengî dê areşen min çareser kî?

_ heta tu çareyekê bibînî.

_ min çu çare nînin, min mafê karî nîne ,ez kesê nanîyasim.

_ û min?! Matu min nanîyasî?!

_ min barê te jî girankir.

_ dîtina te, barê min sivik dikit.!

_ supas.

_ pêdivî supasyê nakit.

Berê xwe da navçavên wî. hest bi tenahîyê kir.

_ dê min gehînîye mala hevala min?

_ dê te kime didilê xwe da..

Kent, kenîya wê tîrojkên hîvîya jê dipeşîn.

Rabûne ser xwe, gileşe xwe kom kirin, havêtine dinav wê teneka gileşî ewa birex wanve .

Ketin beranberî êk.

Du sê cara, li dor xwe zivirî. Kes nedît. Şev tarîye, dem nîv şeve, cih bê denge.

Destên wê girtin, da bersîngê xwe, dinav zendên xweda şidand.

Devê xwe havête devê wê. Ji tirsa careka dî birsî bimînit, berevanî ji lêvên xwe nekir.

_ 11 _

Mosko...

Sal: 2009

heyv: Îlone

Roj: 15 heyvê ye.

Dem: Êvareka direnge.

Cih: Firokxaneya mosko ya nêv dewletîye.

Firokexane, pire ji mirovan. Deng û livîna mêvanan, guha disimt. Firokexane, wek bajêrekî mezne.

Gelek mirovin, gelek kun ü qolaçin, gelek bazar ü bîro ne.

Mirov pêdivî harîkarîyêye heta jinav firokexaneyê derbikevit.

Sivêtlana baş dizanit, kes li benda wê nine. Kes peşwazîya wê nakit. Kes nehatîye berahîya wê. Kes jê xerîb nebûye.

Piştî demekî dirêj û wastîyaneka zor.

Qesta derê kir. Berîka vala, neşîya çu taksîya bigirt. Wek gelek caran, bê kirîna pilêtê. Siwarî tirêna bin erdî bû.

Tirên wek hemû cihên moskoyê, tijî mirove.

Sivêtlanayê, çavên xwe yên biçûk û şîn, tijî dîmenên mirovên mosko kirin. Tijî mejyê xwe bayê genî yê mosko kir.

Dêmê wê geş bû, xwîn li wan geha gerîya, ewên eve demekî dirêje, xwîn lê hişik bûy. hest kir, çarde salîye.

Li wê wîstgeha nêzîkî mala wan, peya bû.

Nevîya êkser biçite mal. Çu çante vê nebûn. Kes li hîvîya wê nîne.

Qesta wan kulan û cadeyên biçûkatîya xwe lê borandî kir.

Gelek gerîya, gelek bîrhatin lê nû bûn.

Tijî mejîyê xwe bêhna hejarîyê kir.Tijî çavên xwe dîmenên kulan û cadeyên taxên hejarên moskoyê kirin.

hind dît lê bû nîv şev.

Zikê birisî, ^ê wastîyay, hizirên xiriş.

Li ber dergehê dapîra xwe rawistîya.

Tijî çava rondik bûn.Berî zenga dergehî lê bidit.Dapîra wê dergeh vekir.

Devê wê beş bû. Destên xwe vekirin.

_ sivêtlana.?! Kiça min. Tu li ber derî çi dikî?!

Girîyê ser ji axiftina wê stand.

_ kurê min jimin standin.. ez kirme derê, ez neşem bêy kurê xwe bijîm.

Xwe havête dinav qerqodê sîngê dapîra xweda. herdwa pêkive berdane girîyê.

Bapîrê wê li dûv dengê wan hişîyar bû.

_ bila çavên te bêne der. Min çend caran gote te, şû bi wî cihuyê pîs neke. Te guhê xwe ne da min?

Dapîr lê xurî û da paş.

_ ne demê van gazindaye, kiçik ya wastîyay û dil şkestîye .here bo xwarin û vexwarinekê amade bike. Dê zûbe.

Da bersîngê xwe û bire jor.

Li jora rûimtinê, sivêtlana rûnişte ser wî cihê hercar li ser dirûnişt.

Bêhna wê fireh bû. hest bi tenahîyê kir.

Çavên xwe li nav malê gêran, hemû tişt wek xweye. Di cihê xwe daye. Çu gihorîn nedîtin.

Tijî dêmê wê bişkurîn bû. Divîya li ser wî cihî binivit, ew cihê gelek şeva heta spêdê li ser dinivîst li ber telefzyonê.

Dapîra wê hizirên wê belav kirin..

_ tu çewanî kiça min? Tu başî?

Sivêtlanayê destê wê girt û maç kir..

_ ez başim pîrê.

Çavên wan ketin êk. Gelek caran, wek hevalan dapîra wê suhbet û gazindên xwe bo wê dikirin. Piştî dayka wê çûy, bo dapîrê hêlay.

_tu çewanî pîrê?

_ ez gelek başim.

_ û bapîrê min? hâşta yê bi gazindeye?

_ ew jî yê başe. Lê jiber pitpit ü gazindên wî, ez dê har bim.

_ hindî min li bîre, ew gazinda dikit. Ji çu neyê razîye.

_ raste .em jî yên mezin bûyn. Êş û pîratî li ser me zal bûyne. Gazindên me dê zêde bin.

Sivêtlanayê destê dapîra xwe girt û maç kir.

_ ez çi dişêm bo hewe çi bikim?!

Dengê bapîrê wê ji jora xwarinê hat.

_ bizivire mala xwe. Were me xudan bike .em pêdivî teyne.

_ û mala min?! Û kurê min?!

_ tijî mosko mêr û kurin. Ma mêr bo kê bûyne mal?

_ biborin, ez neşêm kurê xwe bo wî mêrê pîs bihêlim.

_ mate ne got, ji min standin?!

_ raste, lê min mafê nerazîbûnê heye. Parêzerê min got. Me mafekê bihêz heye. Kurê te dê bo te zivirt.

Bi dengekî nizim, wek gazinda.

_ erê, kurê wî sey xudan bike û mezin bike. Ciwanîya xwe gorî bike. Li dawîyê, dê gehte babê xwe û dê tif kite te..

_ dibit. Lê ez neşêm bêy wî bijîm.

Dapîra wê dengê xwe bilind kir.

_ bela xwe ji kiçikê veke. Ya wastîyay û birisîye.

Milê wê girt, du maç li serê wê dan.

_ hilu kiça min, gazinden wî xilas nabin. hilu here serê xwe bişû û têr bixu û bêhnekê bo xwe binive. Nuke tu gelek ya wastîyay.

Diwê jora biçûk û bê seruber. ew jora hemû biçûkatîya xwe ü sinêlîya xwe têve borandî.

ew jora tijî bi dîwarên wê ve, bîrhatin û hîvîyên wê hilawîstî.

Li ser textê xwe yê gelek şeva heta spêdê çîreçîr ü kevnatîya wî xew jê didizî, xwe dirêj kir. Çavên xwe niqandin.

hest bi tenahîyeka êkcar xoş kir. Gîyanê wê tena bû. Şanen leşe wê xav bûn. Xewê ser ji hemû livîna stand. Dilê wê yê jar dagîr kir. Bire girtîxaneya xwe ya mezin. Bire dîwana heval û biraderan.

Du çeng bo sivêtlanayê dirûst bûn. Tax û kulanên hejarên mosko têkvedan.

heval û dust komkirin. Bîrhatin û yarîyên caran li bîrînan. Gîyanê wê tena nebû.

Bilind firî, dûr ket. Jikulanên hejaran derket. Jibajêrê moskoyê derket. Jisnurên rosîyayê derbaz bû.

Bêy vîze û pilêt. Li hindav bajêrê Nürnbêrg û li ber dergehê mala yarê wê, kete ser erdî.

Dergeh qota. Bejna yarê wê kete beranberî bejna wê ya kin.

_ sivêtlana..?! Tu vê nîv şevê li vêrê çi dikî?

_ ez ya jimosko firîm û hatîm, heta te bibînim. ez gelek ya jite xerîb bûym.

Destê wê girt û bire jor..

_ dê were jor dilê min, ez jî yê ji lêvên te xerîb bûym.

Xwe havête dinav sîngê wî yê rûs da.

Wek biçûkeka sava, da bersîngê xwe yê pîr, beref jora nivîstinê bir.

Nehêla wek gelek caran xwe rûs bikit.

Cilkên wê diberda dirandin. Rûs kir, da ber leq û ramûsanan. Devê xwe havête memkên wê û jidil mêtin. Xwe berda dinav

pêsîra wêda û givaşte ber sîngê xwe.

Berî qêrîyên wê yên sinêleyî bi ser bikevin. Berî girê mêyatîya wê vemirt.

Dergehê jora wê hate qotan.

_ sivêtlana? Spêde baş. hilu kiça min, direnge..

Sivêtlana, rast rabû ser xwe. Tijî jora wê ronahîya rojêye.

Li dor xwe zivirî, kes nedît. Benduskên memkên wê divekirî bûn. Derpê kurtkê wê dipîya nebû.

Tijî devê wê tama ramûsanên gerim bûn..

12

Nürnbêrg...

Sal: 2009 heyv: Çirîya êkêye Roj: 3 heyvêye Dem: Nîvşeve Cih: Baxçeyekê giştîye.

Pêjina mirovekî li hindav serî hat. Tijî gîyanê wê tirs kir. her çende li vî welatî û li cihên hosa kes natirsit.

Tirsa wê hêşta ya kulanên moskoye.

Li ser milê xwe zivirî. Îvan wek peykerekî li hindav serî rawistîya bû.

Rast rabû serxwe û qesta wî kir. Xwe havête dinav sîngê wî da.

_ îvan dilê min. Supas bo hatina te. Min bawer nedikir to dê hêy. ez jidil hez te dikim.

Xwe dinav sîngî da şidand.

Îvan rawistîyay ma, çu livîn nekirin. Destên xwe berday hêlan.

_ ez nedihatim, lê min zanî te çu cih nînin lê vehewî.

Dest da milên wê. Ji sîngê xwe dûr kir.

_ nihu wek hercar tu ya bê parey û ya birisî?

Devê xwe havête devê wî..

_ ez bi dîtina te têr bûm.

_ hilu, da biçine mal.

_ mal..? Mala te?

_ erê... Lê..

_ lê çi? ha?

_ bo demekî kurt. Divêt tu bo xwe cihekî peyda bikî.

Serê xwe şor kir. Dengê bêomêdyê ji axivtina wê hat.

_ min çu cih nînin. Min mêrê xwe ji ber te hêla. eva hatîye serê min jiber te bû. Tu baş dizanî.

_ wene bêje .hewe pêk nedikir.

_ raste, lê tu eger bûy. Ji ber te me pêk nedikir.

_ nihu. Ne demê van gazindaye. Tu ya birisî û wastîyay.

Milên xwe dane êk. Qesta mala îvan kirin.

Piştî xwarineka bê seruber. Du qodîkên bîrê vekirin. Du cigare hilkirin.

Lêvên qodîka lêkdan. her êkê du fir berdane gewrîya xwe. Çavên wan ketin êk.

Wek hercar. Wê dest bi bilind kirina alay kir.

Devê xwe havête devê îvan û bi eşiqeka dijwar mêt.

Berî qodîka diwê berdine gewrîya xwe. Sivêtlanayê xu rûs kir. Îvan hindek bîra tezî berda nîva memkên wê yên biçûk.

Bi ezmanê xwe ,ew bîre alîst.

Sivêtlana xav bû, çavên xwe niqandin. Îvan li ser sîngê xwe yê spî dît.

Şerâ wan yê sêksî wek hercar, heta berê spêdê berdewam bû.

Spêdê zû, herdu ji serşûye derketin.Qehweyek vexwarin, hindek nan û pêxwarin amadekirin.

Sivêtlanayê ji enîya wî ya girê dizanî mêvaneka girane.

Dizanî piştî wan parîyên mayîn ji xwarinê, dê dîsan kefte kulanan. Dê dîsan mînte birisî û bê cih û war.

_ bibore ,ez gelek li mala te Namînim.Tinê harî min bike heta ez bo xwe cihekî bibînim.

_ min negotîye te nihu here. Lê tu..

_ ez dizanim bo te girane .ez dizanim dibit nihu kurê te, yan jina te, bêne derî û me hosa bibînin. Bo min qet ne keşeye ..ez azadim dijîyana xweda.

_ lê bo min keşeye û keşeyeka mezne.

_ rast?! Lê bote hosa dest nadit. Divêt tu xwe êk dil bikî.

_ ez pêdivî demî me. Bêhna xwe li min fireh bike.

Serê xwe dana ser milê wî.

_ ez dê heta mirinê li benda te bim.

_ bibore, serê min û dilê min mijûlî êka dîne wek tu dizanî.

_ erê, ez dizanim. Lê kes wek min hez ji te nakit. Tu dizanî?

_ dibit, lê ez pitir hez jiwê dikim.. Bibore ,eve rastîye.

_ û wê tu nevêy. ew yarîya bite dikit.

_ yarîyên wê, berdewamyê didite jîyana min. ez jiber wê dijîm.

Sivêtlanayê serê xwe şor kir. Zanî sîngê wê yê biçûk û leşe wê yê zarokînî û nazik. Neşen hizirên îvan jîyara wî bidizin.

Lê çu çare nîne. Çu rê nînin. Divêt cihek hebit lê bixut, lê binivit.

Serê xwe bilind kir, îvan yê dinav hiziran da berzebûy.

_ îvan..? Tu dişey hindek para bidîe min bo demekî kurt.?

Îvan jinav hizira der ket..

_ pare..? Madê min pare jikîve hebin? ez wek te bê karim. Bibore.

_ tinê min divêt telefona hindek hevalan bikim.Min divêt biçime mala hevala xwe marîya yê. Wê cih yê hey. Ya bitinêye.

_ ez dê te gehînime mala marîya yê.

_ nene supas. Wek hercar, dê bê pilêt çim.Lê min divîya telefonê bo bikim. Dibit li mal nebit.

Jor bê deng bû. her êk dinav hizirên xuda çû xwarê.

Zenga telefona îvan ya berîkê dilên herdwa lê kire lez. Çavên wan ketin êk. Îvan yê bi lez bû.

_ helo?

Dengê yara wî, tijî dêmê wî bişkurîn kir.

Sivêtlanayê, zanî cihê wê li nav dilê wî û li mala wî neman.

Dest da çantkê xwe yê vala û bêy xatir xwastin ji mala îvan derket.

Li serê kulanê, gelek rawistîya. Berê xwe da çep û rast. Nezanî dê kîve çit? Nezanî dê hewara xwe gehînte kê?

hizira azad kir. Dengê wî tijî serî bû.

_ sivêtlana, herdemê tu pêdivî min bûy, tu dizanî dê min li kîve bînî!

ez dê li benda te mînim. ez neşêm bêy van memkan bijîm...

Qesta wî cihî kir. Cihê jivanên wan yên hercar. ew cihê gelek caran li hîvîya wî dima. ew cihê çend carekê birisî dibû, yan pêdivî para dibû, qesta dikir.

Azad jî wek nêçîrvanekê şareza, her çend rojaka rêya xwe diwî cihî diêxist.Dibit xezala wî ya birîndar bit! Dibit xezala wî ya birisî bit!

Dibit, pêdivî harîkarîya wî bibit...!

Sivêtlana li ser textekê darî, li beranberî rêya diçite mala azad

A • .

runişt.

Wek pelatînka diçite ronaeya agirî. Zanî eve rêya wîye. Zanî dê her hêt. Dê çavê wî bi bejna wê kevit. Dê tijî dêmê wî xoşî bit. Dê çend careka li dor xwe zivirt. Ka kes nabînit!

Dê kite di nav sîngê xweda û şidînit. Dê devê xwe havête lêvên wê û jidil mêjit. her zû, dê destê xwe kite dinav memkên wê da. Dê hêdî hêdî bite cihekî nepenî û tarî. Dê bendoşka sîngê wê vekit.

Dê serê memkên wê kite didevê xwe da. Dê bi destê dî, qayşa penteronê wê vekit û dê kêşte ber sîngê xwe û na rawistit heta xwe têr nekit..

Piştî têr bibit. Dê danite ser ranê xwe û dê dite ber maçan û dê dest bi pirsîyaran kit.

_ sivêtlana..? Tu çewanî başî? Bibore ,ez gelek jite xerîb bibûm. Te

ez şet kirim.

Tu başî? Tu li kîve bûy? Li kîve dijî? Te kêşe hene? Te pare hene? Tu pêdivî harîkarîyêy? ez amademe ?!

Dê xwe kite xoş mirov. Dê bite pêxember.

Gelek li hîvîyê ma, gelek wastîya, birsî bû, xewa wê hat. Kes dîyar nebû.

Çend kesek didît, serê xwe bilind dikir. Dêmê azad dihate pêş çavan.

her kesê didît, dizanî ya li benda yarekî, xoştivîyekî. Yan pêdivî harîkarîyêye. Ya bê xudane !

_ nehat. Tu çu car hosa gîro ne bûy? Te xêre? Yan eve jî bextê mine?!

Neçarbû, xwe dirêjkire ser texê req ü sar.

Xew ji birsa nahêt. Serma tijî hinavên wê yên vala bû.

Berî bê omêd bibit, berî hemû hîvîya ji dest bidit, berî neçar bibit. Lêvên xwe û memkên xwe li ser wî textê req û hişik bi erzanî

bifiroşt.

Bejna azad ji dûr dîyarbû. Serê xwe wek hercar, yê şor kirî. Yê şerê dinîyayê bitilên xwe dikit. Çu tişta li pêşîya xwe nabînit. hizira mejî û çavên wî yên tarî kirîn.

Sivêtlana, rast rabû ser xwe. Tijî dêmê wê hîvî bûn. Li pêşîya wî xwe kire kêl.

Azad kete beranberî bejna wê ya kin.

Dêmê wê yê wastîyay. Rengê wê pêtî kirbû. eve demekê dirêje nedîtî. Bawernekir eve ewe.

Çend pirsîyar dikir, digotin ya çûye mosko û nazivirt.

Çavên wan ketin êk, axivtin jibîr kir.

Çavên azad ji xerîbîya wê da zîq bûn.

Çavên sivêtlanayê ji birisa zîq bûn.

Sivêtlanayê neşîya xwe li ser pîya bigirt. Divîya rûnite ser wî textê birex xweve.

Azad destê wê girt..

_ sivêtlana?! eve twî, yan ez xewna dibinim?!

Sivêtlanayê, wek nesaxa bersiv da..

_ erê.. eve ezim.

Vê carê çu hizir nekirin. Vê carê li dor xwe nezivirî. Sîngê xwe

vekir, sivêtlana kêşa dinav sîngê xweda û jidil şidand.

Xewa sivêtlanayê gelek dihat. Dinav sîngê wî yê gerim da xaf bû. Berî binivit. Zikê birisî, tijî çava rondik kirin. Ji dil girîya.

Azad wesa hiriz dikir, ji xerîbîya wî da digirît..

_ tu bo digirî? Tu ji min xerîb bûy? Yan te xêre?

_ ez jibirsa digirîm.

Tijî çavên azad rondik bûn.

_ were da biçine xwaringehekê. Min çend caran gotîye te ,heker tu pêdivî min bûy, ez amademe?!

Dengê girîyê ji axivtinên wê dihat.

_ min telefona te nebû.

_ hişiş, çu suhbeta neke .heta tu têr bixwî. Paşî em dê axivin.

Qesta wê xwaringeha gelek caran diçûnê kirin. Wek hercar, li

paşîya xwaringehê û li cihekî veder rûniştin.

Xwarin daxwazkirin. Berî xwarin amade bit. Dû qodîkên bîrê daxwazkirin.

Sivêtlanayê bîra xwe kire du qorç. Daxwaza bîreka dî kir.

Azad zanî, heker sivêtlanayê du sê bîre vexwarin. Dê serxoş bit. Dê bi sanahî kite dikoşa xweda. Dê li ser sîngê wê yê biçûk kite şer.

Ji kenîya wê ya bilind ditirsîya. Piştî du sê bîra, dibû kenîya wê. Yarî dikirin, devê xwe ji devê wî ne dîna der. Gelek caran, li nîva bar û meyxaneyan radibû leyzokê.

Qodîka diwê da ser devê xwe. Neberda heta binîvî kirî.

Çavên wê sor bûn. Berê xweda çavên azad.

_ tu bo na axivî? Te vê carê lêvên min nemêtin? Te ez ne kirme

dikoşa xweda? Te..

_ me dem yê hey. Lezê neke. Bila tu têr bixwî, û tena bibî. Paşî te çi bivêt ez amademe.

Bi kenîyeka bilind.

_ min tu divêy. Min divêt tu lêvên min bimêjî.. Dê were dê..

Devê xwe havête devê wî.

Azad zû devê xwe jinav devê wê îna der..

_ ma li vêre?! Li nav van mirovan?!

Sivêtlanayê berê xweda wan mirovan.

_ erê, li vêrê. Ma kê ageh jime heye?

_ eve cara êkêye tu vê daxwazyê dikî. Tu bi du qodîkên bîrê serxoş dibî. Te xêre?

_ ne ,ez ne serxoşim. ez dil xoşim.

Kenîya wê berê sê car mêvanên xwaringehê dane mêza wan.

_ hêdî... Te berê hemûyan da mêza me.

Bikenîyeka bilindtir.

_ ma min çi kirîye?!

_ dengê xwe bilind neke .em nebtinêne.

_ tu ditirsî?

_ erê, ez ditirsim.

_ ji kê ditirsî?

_ ji te ...em dê xwarina xwe xun û dê çine derê wek hercar. Paşî tu bêminetî, bike hewar, bike qêrî. Serê xwe bixu..

Xwarin bo înan, bi lez xwarina xwe xwarin. Çar qodîkên bîrê kirîn û pakîteka cigara û bermaykên xwarina xwe digel xwe birin û der ketin.

Li ber derê xwaringehê milê sivêtlanayê girt.

_ sivêtlana, tu li vêrê rawste .ez dê çim tirumbêla xwe înim û dê hêm.

_ te çi li bere?

_ em dê çine gerîyanekê.

_ gerîyanekê? Yan bêy gan bêhna te nahêt?!

_ te nihu divîya em dixwaringhhê ve ganê bikin. Te lêvên min xwarin.

_ tinê min divîya lêvên te maç bikim.

_ heker te nevêt em naçin!

_ nene ,here tirumbêlê bîne .ez dizanim heker tu bêhna xwe neînî,

dê şet bî.

Wek gelek caran, bi lez qesta tirumbêla xwe kir. Sivêtlana siyarkir ü beref dervey bajêrî hajot. Li cihekê veder, tirumbêla xwe rawistand.

Destê sivêtlanayê girt û bire dinav daristaneka tarî da.

Pişta wê da qormê dareka pîr. Lêvên wê mêtin. Destê xwe bire nav sîngê wê. Serê memka kire didevê xweda. Bi destê dî, qayşa penteronê wê vekir.

Penteron kete bin pîya. Kiras ma biçeqê darê ve hilawîstî.

Keşa ber sîngê xwe ü çend careka agirê nêratîya xwe vemirand.

Wastîyan, qesta tirumbêlê kirin. Kursîkên tirumbêlê kirine text û li ser nivîstin.

Li berê spêdê, jiserma hişîyar bûn.

Nevîya wan memkên rûs vesèrt. Xwe havête ser singe wê yê spî. Lexrînîya xwe şkandin, paşî qesta nav bajêrî kirin..

13

Nürnbêrg...

Sal: 2009

heyv: Çirîya êkêye

Roj: 7 heyvêye

Dem: Spêdeyeka zûye

Cih: Baregayê polîsên Nürnbêrge.

Di joreka biçûk da, sivêtlana li beranberî du polîsan, li ser kursîkekè rûniştîye.

Tijî çava xewe. Rengê wê yê zer, nîşana mandîbûna wêye.

Polîsê li ber sîngê wê, serê xwe jinav wan kaxezên di nav destan da îna der. Berê xwe da çavên wê yên nîv nivîsitî..

_navê te?

Sivêtlana ji xewa giran hişîyar kir.

_ sivêtlana.

_jîyê te?

_ hejde sal.

_ cihê heûyana te?

Bê deng bû, serê xwe şor kir.

Polîs ma li hîvîya bersivê. Bersiv gîro bû. Polîsî berê xwe da navçavên wê.

_ tu li kîve dijî?

Çavên xwe êxistine çavên polîsî.

_ min çu cih nînin.

Polîs ma rawestîyay, carekadî, ji dil berê xwe da çavên wê.

_ te çu cih nînin?! Pa tu li kîve dinivî? Li kîve dixwy? Çewa dijî?!

Yarî bitilên xwe kirin. Çavên xwe şorkirin. Nedivîya polîs çavên wê bibînit.

_ her roj li nik hevalekî. Xwarin.. her dê tiştek hebit ez bixum.

_ çewa dibit tu bê cih bijî?

_ min cih hebû, dadgehê da mêrê min yê berê.

_ tu dizanî jiber çi tu li vêrêy?

_ nexêr, ez nizanim!

_ te mafê manê li elmanîya nemaye. Vîza te ya xilas bûy. Gelek siza û deyn yên ketîne ser te. Te xwe ji polîsan û ji deyndaran

veşartîyC.

Sivêtlana rabû ser xwe. Tijî navçavan kerb û tirs bû.

_ deyn?! Min çu deyn ji kesê nekirîne!

Polîsî hindek kaxez bilind kirin.

_ belê, tu şeş caran hatîye girtin ditirênêda, jiber te pilêt nebû.

_ ew raste, lê min negotîye ez sizayê xwe nadim.

_ belê, te sizayê xwe nedaye ü nihu yê zêde bûy.

_ çu name negehştîne min!

_ gelek name û hoşdarî bo te hatîne. Jiblî wê, te kirîya xanî û parên av û kareban nedayne.

Carekadî, sivêtlana rabû ser xwe ü dengê xwe bilind kir.

_ heware ..eve çend heyve ez dixanî ve najîm, xanî yê bo mêrê min yê berê may. Dê çewa kirîya xanî dim?! Û parên av û kareban, min bi destên xwe dayne mêrê xwe, da bi dite benkê. Dîyare wî nedayne benkê. erê, wî name û kaxezên min jimin vesaitine, da ez

tûşî areşa bibim.

_ bibore ,ez nizanim hewe çi keşe hene. Deyndar daxwaza parên xwe dikin.

_ min gelek caran hîvî jê kirîye .heker nameyek, yan kaxezek bo min hat, min agadar bikit. her digot. Çu tişt bo te nehatîne û dûr keve ji mala min. Wek hûn dizanin, min maf nîne biçime mala xwe.

Polîsî, hindek kaxez têkvedan.

_ bibore, nihu pitir ji çar hizar yuruya yên ketîne ser te. Divêt tu bidî. Te çu çare nînin.

_ min bihayê nanekê nîne, dê çar hizar yuruya ji kîve înim?!

_ em neçarin te bidine dadgehê. Dageh dê birîyara girtina te dit.

_ ez dişem di gel parêzerê xwe baxivim?

_ belê, te maf heye. Keremke.

_ bibore, min telefona wî nîne .ez dişem biçime nik wî û sube digel xwe bînime vêrê?!

_ erê, heker tu nasname û pasporta xwe li nik me bihêlî.

Sivêtlanayê, çantê xwe vekir, nasname û pasporta xwe havêtine ser mêza polîsî.

_ supas. heta sube.

_ bibore ,eve erkê meye .hîvîye gîro nebî. Da sizayê te zêde nebit. Van kaxezan nîşan parêzerê xwe bide.

_ ez gîro nabim. Dîsan supas.

_ heta dîtinekadî.

_ heta dîtineka dî.

Polîsî hindek kaxez kirine di destî da û derket.

Li ber dergehê baregayê polîsan,sivêtlana ma rawistîyay.Nezanî dê çi kit? Dê kîve çit? hewara xwe bigehînte kê?

Ne pareye û ne telefone. Ne hevale û ne cihe.

her hevalê nihu daxwazîya harîkarîyê jê bikit. Divêt xwe bo rûs bikit. Divêt li ser sîngê xwe binivînit.

Neçar bû, wek hercar. Qesta tirênê kir. Bê pilêt siyarbû.

Bê jivan qesta parêzerê xwe kir. Kaxezên xwe danane bersîngê parêzerî.

Parêzer dinav kaxezan da gerîya. Çu tişt nedîtin pê berevanyê jê bikit.

Berî parêzer baxivit. Sivêtlanayê vîya tirsa di dilê xwe da bo wî dîyar kit.

_ ez nizanim çi bikim?! Dê min kine digirtîxanê ve.

Parêzerî serê xwe jinav wan kaxeza îna der.

_ ne tirse .ez nahêlim te bikine digirtîxanê ve .hindek kaxez têkvedan..

_ lê divêt tu van paran bidî.

Bikenyeka zarokînî.

_ min negotîye ,ez nadim. Lê min nihu bihayê nanekê nîne, dê çewa çar hizar yuruya dim?!

_ em dişen bikine besèn biçûk. her heyv tu dê beşe kî dî.

_ lê ev pare divîya ba mêrê min daban! Min da bûne wî. ew berpirsîyare.

_ min ew jibîrnekirîye .em dê dawayekê li ser wî jî tomar kin. Wî ev kaxeze ji te veşartîne .ew berpirse ,eve dê te ji girtîxanê rizgar kit. Lê dana paran çuçare nîne, divêt her bêne dan.

_ û kurê min?! Me ew yê jibîr kirî. heta kengî ez dê ji kurê xwe dûr bim?!

_ nene ,ez piştrastim dê kurê te gehte te. Tinê em pêdivî hindek demine. Xwe bigire.

_ min mafê manê nemaye li elmanîya. Tu dizanî?!

_ ew jî dê çareser bit. hindek kaxez dane destê wê.

_ here van kaxezan bo polîsan bibe .ew dê te bo demekî kurt azad kin. Di wî demî da, em dê daxwaza mana te kin, û van paran kine beş û dê dest bi dadgeha mêrê te kim.

Tijî dêmê wê keyf bû.

_ netirse ,ez jivan hemû areşan natirsim.Lè bibore, min hindek pare divên, ez neşem bê pare kar bikim.

ew keyf û xoşîya wê bûne tirs.

_ pare !?ez dizanim, piştrast be dê parên te dim.

_ kengî? ez neşem gelek xwe bigirim.

_ nene, li van rojan hindek pare dê bo min ji mala min hên.

_ bo zanînate ,ez neşem bê pare biçime dadgehê.

_ xema para nexu. Dê bo te peyda kim.

Kaxez ji destê parêzerî înane der û der ket.

Li serê cadê, dinîya li peş çava tarî bû.

Pare.. Gan..

her cihê tu biçiyê. Pare divên her kesê tu silav bikiyê gan divên. eve çi jîyane em têda?!

_ divêt tu para bidî.

_ parên dewletê. Yên parêzerî. Yên tirênê yên telefonê.

_ te pare divên?! Xwe rûs bike..

_ te kirîya xanî ne daye.

_ te bihayê av û kareba nedaye. Te sizayê xwe nedaye.

_ were li ser sîngê min. Dê tijî paxlên te parekim.

Li vî welatî kes nabêjit ha bo te .hemû dibêjin kabîne.

Serê wê tijî deng bû. Çav lê zîq kirin. Dengê azad bi ser hemû dengan ket.

_ te pare divên?

_ tu neya pêdivî harîkarîya mini?!

Tinê ewe vê pirsîyarê jê dikit. Tinê ewe dibêjtê te pare divên?!

_ ka çantê xwe veke! Te pare hene?

_ te pare divên?!

_ tu pêdivî paray?!

Bêhna xwe hilkeşa, dengê wê biser ket.

_ erê, ez pêdivî parame.

_ erê, min pare divên.

_ erê, ez pêdivî teme.

Li dor xwe zivirî, kes nedît. Qesta cihê jivanên xwe digel azad kir.

_ dibit, dîsan dîyar bit. Dibit jimin xerîb bibit. Dibit, dilê wî biçite ganekê. Dê nihu ji mal derkevit, çite bazarî.

Nene, dê nihu ji bazarî zivirte mal.

Nihu demê xwarina nîviro ye. Nihu yê birîsîye. Jina wî, xwarinên gelek xoş bo dirust dikit.

Xuzî nihu min hindek ji xwarina jina wî xwarba. Xwarinên welatê wan gelek dixoş û bitamin.

ez nizanim bo çi li dûv min digert? Jina wî ya ciwan û lêkday ye. Mala wî ya bê kêmasîye.

_ te çi jimin divêt? Çi jite kême?

Devê xwe havête serê memkê wê.

_ ev hêke ji min kême.

Tijî cihî kenî kir.

Gelek bo xwe axfit, gelek rawistîya. Gelek wastîya. Kes dîyar nebû.

_ dibit li mal nebit. heker yê nesax bit?! Ne ne ,ew dizanit ez pêdivî wî me .ez pêdivî parame. Dê her dîyar bit, dê her hêt.

Şev bi ser da hat, azad dîyarnebû. Neçar bû, qesta mala hevala xwe kir. Wek mêvaneka giran û birsî nivîst.

Spêdê zû, qesta baregayê polîsan kir. Kaxezên parêzerê xwe dane polîsan. Polîsan çu pûte pê nekirin.

_ ev kaxeze keşate çare nakin. Divêt tu van para bidî. Yan girtîxane.

_ ez narevim. Dê van para dim. Bo min bikine çend beş.

_ ew ne karê meye. Dadigeh dê birîyarê li ser dit.

_ kengî dadgeha mine?

_ piştî em kaxezên te bihinêrine dadgehê. Dê rojekê dîyar kin.

_ nihu ez çi bikim başe?

_ divêt tu bêye girtin. Dê bîye mêvana me heta demê dadgehê.

_ bibore, min xwe asê nekirîye. Boçî bême girtin? Dê roja dadgehê amadebim.

_ nabit, eve yasaye. Divêt tu bêye girtin heta roja dadgehê.

Çu rê neman. Serê xwe bilind kir.

_ hûn dişen parêzerê min agadar bikin?!

_ belê, em dê agadar kin.

Rabû da qesta girtîxanê kit.

_ ez amademe..

_ keremke rûne .heta kaxezên te dirust bikim, dê te hinêrme girtîxanê.

Piştî demekî kurt. Du polîsan milên wê girtin û dane berahîya xwe..

Nürnbêrg...

Sal: 2009 heyv: Çirîya êkêye Roj: 8 heyvêye Dem: Êvareka direnge.

Cih: Girtîxaneya Nürnbêrg ya jinaye.

Kelamçe ji zendên wê yê nazik vekirin. Berdane nîva joreka mezin û tijî mirov.

Textekî asnî nîşa dan. Balîfkek û du betenî danê.

_ eve cihê teye û eve hevalên tene.

Polîsî berê xwe da girtîyan.

_ navê hevala hewe sivêtlanaye .hîvîdarim, demekê xoş pêkive biborînin.

Çavên xwe yên biçûk, li jorê gêran. Tijî dilê wê tirs bû.

Gelek dengan gotinê..

_ bixêrhatî..

_ hîvîye, zû derkevî..

Persfa kesê neda,xwe havête ser textê xwe û xwe dirêj kir û bêdeng wek mirîekî ma. Divîya binivit, ji dinîyayê û xemên wê dûr kevit.

Jor tijî deng û kenî ü suhbetin.

her zû, du jina divîyan kêseya wê bizanin.

Li hindav serî bûne kepir.

_ helo. Navê min marîyaye .ez xelka çîkim û hevalamin, navê wê fanê ye .ew xelka bolgarîyaye.

Sivêtlanayê xwe şir kir, bersiv neda. Ji cihê xwe ranebû.

_ û tu? Navê te çi bû? Tu xelka çi welatî?

Zanî vêrê jî necihê nivîstin û tenabûnê ye.

Berî bînine girtîxanê, di dilê xwe da digot..

_ ez dê çend rojeka li girtîxanê têr xum ü têr nivim.

Lê wesa dîyare, girtîxane û ev welate ne cihê nivîstin û tenabûnêne.

her du jina pitir xwe nêzîkî wê kirin. Rûniştine ser textê wê.

_ netirse ,em hemû hevalin. Girtîxaneyên vî welatî ne wek yên welatên mene .eve ne girtîxaneye ,eve hotêle.

Kenîya wan tijî serê sivêtlanayê êş kir.

Neçar bû, rabû ser textê xwe.

_ navê min sivêtlanaye .ez xelka rosîya me, ji moskoyê.

her zû, dest bi pirsîyareka dî kirin.

_ tu jiber çi girtî?

_ jiber hindek pare yên li ser min.

her diwa pêkve berdane kenîyeka çivêl.

_ evên li vê jorê hemû jiber para digirtîne. Kesê çu mirov

nekuştîne.

Pare. Pare. Pare...

Jiber para me welatê xwe hêla. Jiber para me leşe xwe firot. Jiber para em ketin di girtîxaneyan da jiber para...

hevala wê destê xwe bi devî vena.

_ hişiş, rawiste. Dabizanin ka çewa ji ber paran?

Çavên sivêtlanayê zîq bûn.

_ bibore, çewa jiber para? Te pare dizîn? Yan pare digel te girtin? Yan..

Bêhna hevala wê teng bû.

_ yan te pare kopî dikirin?

Kenîya wan hindek jinên dî lê kom kirin..

Sivêtlanayê bidengekî bilind û turey ve got.

_ min parên kirîya xanî û yên av ü kareba nedabûn. hindek sizayê tirênê li ser min mabû. ez li elmanîya nemabûm. Kaxez û daxwazên polîsa negehştine destê min. hewe zanî..? Yan..

_ hema bêje, min karê reş kirîye.. Min leşfiroştin kirîye, min hizar hîle li pîremêrên elmana kirîne. Wek me hemûyan.

enîya wê bû girê.

_ ew ne karên minin. Van suhbeta digel min nekin. ewa min gotî ew rastîye. Bela xwe ji min vekin. Min divêt bimînime bitinê. Biborin.

hevala wê zanî ture kirin.

_ bibore ,ew yarîya dikit. Tu dizanî dem li girtîxanê gelek girane . hindek caran hestyên mirovî jî giran dikit. iha hosa hindek hesitî giran suhbetên çivêl dikin. Bibore.

_ ez gelek ya wastîyay me.Min divêt binivim heker hûn min bitine bihêlin, dê supasdarbim.

Kitkte çûne ser cihên xwe .hêlan bitinê dinav hizirên giran da.

Tijî şanen leşe wê tirs bû.

_ eve ya ji min kême .ez ketim dinav leşfiroş û tirîyakçîyan da. Dê çewa ji vêrê derkevim?!Dê çewa xwe parêzim?Kî dê li tana min hêt? ey hewar, ez her nihu wastîyam. ez dê dîn bim.

Du çavên zîq li hindav serî hizirên wê kirine tirs.

_ tu ya hişîyarî?

Rabû ser xwe, berê xwe da navçavên wê yên tijî bê şermî.

_ netirse ,ez te naxum.

_ ez natirsim, lê min nevêt çu suhbeta bikim, û...

_ û çi? Te nevêt li vî welatî bijî? Te nevêt bibîe xudan pare û tirumbêl û xanî û.

_ min çu nevêt. Tinê bela xwe ji min veke.

Berê xwe da hevalên xwe, kesê ageh jiwan ne bû. Xewê hemû mirandibûn.

_ bêje ê..!

_ ez nabêjim ê.

Neçar bû, dengê xwe nizim kir.

_ eve telefona mine, piştî tu jivêrê derkevî peywendyê bi min bike . em dê pitir axivin.

Kaxezeka biçûk hindek jimare li ser, kire dinav memkên wê yên nîv rûs da û hêla mendeheoş..

hêsta serê wê baş neketîye ser Balîfka wê. Pêjina êkadî li hindav serî hat. Dengê xwe bilind kir.

_ ü te çi divêt?! hûn bo nahêlin ez binivim?

Destê xwe bi devî vena. Rûnişte birex ve.

_ hişiş, dengî neke. Min başîya te divêt. Tu halê xwe nabînî! Te nan nîne bixwy.

Vê ciwanîyate û jîyê te. Koma paranin. Xwe bê aqil neke.

Dengê xwe nizim kir, berê xwe da wan kelexên nivîsitî.

_ eve telefona mine ,heker tu derketî, peywendyê bi min bike .ez dê hême beraeyîya te, dê cih û karî bote amadekim. Bawer bike, dê didemekî kurt da bîye xudan pare ü hemû tişt.

Nevîya li ser cihê xwe bikite der, berî bizanit ka çi kare bo dîtîye, xwe nezan dîyar kir.

_ çi kare em dê pêkive kin?!

_ da em derkevin û êk bibînin, em dê li ser axivin.

Tijî navçavan kerb bû.

_ leşfiroşîye? Mane?!

_ nene ,ew ne karê mine. Min mêr û biçûk hene .ez wan karan nakim.

Şerim ji xwe kir..

_ bibore, bibore. Min wesa hizir kir ewên li vêrê hemû leşfiroşin.

_ kes li vî welatî sera ^firotinê nahête girtin. eve hemû direwa dikin.

_ pa eve hemû sera çi hatme girtin?!

_ hind sera dizyê. hind sera karê reş. hind sera deyn û direwa. Û... _ û tu? Tu sera çi hatîye girtin?!

Serê xwe şor kir.

_ gelek pare li nik min dîtin. ez sera para hatîme girtin.

_ parên çi bûn? Yên kê bûn?

_ yên min bûn.

_ te çewa peyda kiribûn?

_ wan jî ew pirsîyar dikirin! heker em derketin û me pêkive karkir, dê bo te bêjim.

_ em dê çi kar pêkive kin? Çi kare wesa pare pêve dihên?!

Devê xwe bire bin guhî.

_ firotina dermankan.

Çavên wê zîq bûn. Devê wê beş bû.

_ çi.? Firotina derm..

Destê xwe bi devî vena. Nehêla dengê wê bi ser bikevit.

_ hişbe, bila kesê guh lime nebit. Bawerbike ,eve hemû hîvîya jimin dikin, digel min kar bikin. Lê min êka wek te ciwan û biçûk divêt.

_ ez van karan nakim. Min kurek yê hey, min hevalek yê hey. ez nepêdivî van karame .here, bela xwe jimin veke.

ew kaxeza di destîda kire di destê wê da.

_ eve telefona mine ,heker te hizira xwe guhart, yan tu pêdivî harîkarîya min bûy. Telefonê bike ez dê zû li tana te hêm.

_ ez ji birsa bimirim, ez wî karî nakim.

Cih bê deng bû, xew sil bû. Çavên wê bibanê zîndanê ve mane hilawîstî.

Ma li hîvîya êka dî, bête hindav serî, barê wê girantir bikit.

Jorbê ding bû, xew giran bû, hizir belav bûn.

Cihê teng û nexoş , leşe wastîyay û hizirên belav, tirs ji pêşerojê. Xew kire kabûs.

Mêrê wê yê berê. hevalê wê yê nü. Digel dustê wê azad.

hersê wek sê hevalan. Milên xwe yên dayne êk.

Qesta wê dikin. Li ber sîngê wê rawistîyan. hersêyan xwe rûs kirîne. Leşen xwe yên nêr. Nîşa wê dan.

Çavên wê zîq bûn. Berê xwe da, ^ê mêrê xwe yê berê. Jê têr bibû. Berê xwe da ^ê hevalê xweyê nü. Gelek jê xerîb bibû. Berê wê kete ^ê azad, wek her car, jê têr nedibû.

hersê ya, qebê wê dixwastin.

_ were, sivêtlana. Te gelek hez ji min dikir. Te digot, te min

har dikit.

hevalê wê got:

_ nene .ew mirîya mine .heta spêdê dinav devê wê da bû.

Azad, wek fîlmekê sêksî, xwe nimayiş dikir.

_ kes wek min wê têr nakit. ew evîndara leşe mine. Maneweye sivêtlana ?

Sivêtlana di nav dengên wan da gêj bû. Nezanî dê bersiva kê dit?! Nezanî dê qesta kê kit.

Mêrê berê ji dil vîya bû. Wî ew hêla û bi dûv êka dî ket. hevalê nü, jidil divêt, lê wî sê car hevalên dî yên heyn. Azad yê dil saxe û merde. Lê xudan jin û biçûke.

Di cih da ma, neşîya çu birîyaran bidit.

hersê ya, wesa rûs, qesta wê kirin. Li dor zivirîn, destên xwe havêtine leşe wê yê rûs.

Berê xwe da xwe, ya rûse. Nezanî çewa rûs bû? Kê rûs kir?

hind xwe dît, ya dibin her sêyanve. Li ser sîngê wê yê rûs şere.

Nevîya bikite hewar, nevîya dilê êkî ji wan bihêlit. Neşîya çu birîyaran bidit. Neşîya êkî bitinê helbijêrt.

Gelek jimêrê berê xerîb bibû. Gelek divîya li ser sîngê hevalê xwe binivit. Gelek divîya, azad lêvên wê, memkên wê bimêjit. Nedivîya kesê ji dest bidit.

Xwe dinav ^ên wan yên rûs û gerim da mirand. Xav bû, berî bikite hewar. Berî agirê mêyatîya wê vemirt.

Dengê seqatên girtîxanê, hersê yar, li ser sîngê wê yê nazik revandin.

_ spêde baş. hilûn, demê xwarinêye. hemû rabûn ser cihên xwe.

_ sivêtlana.. Parêzerê te yê li hîvîya te. Xwe amade bike bo dîtina wî.

Tijî dêmê wê hîvî bûn. Bi lez da dûv polîsî û qesta joreka taybet kirin.

Li jora taybet, rûnişte bi rex parêzerê xweve.

Tijî dêmê her diwa hîvî bûn.

_ te çewa zanî ez li vêrê me?

_ polîsan cab da min.

_ dê şey çi bû min kî?

_ dê te ji vêrê xilas kim. Lê divêt tu hemû parên li ser xwe bidî.

_ çewa bidim?! Min pare nînin? Min kar nîne?

_ dê bo te kime çend beş. her heyv beşekî bide.

_ gelek başe .heker ew razî bibin.

_ dê razî bin.

_ supas bo te, nihu çi li ser mine bikim?!

_ supasî pê nevêt. Van kaxezan îmza bike. Da digel min bêye derê. _ hosa bisanahî?!

_ne bisanahî bû. Bizehmet min şîya wan razî bikim. hişîyar be, deynên xwe gîro neke.

_ nene, dê her heyv beşekî dim. Tinê ew razî bin. ez neşem li vî cihî bijîm.

Parêzerî, kaxezên xwe lêkdan.

_ here karê xwe bike ,ez dê van kaxeza dime wan û dê li benda te bim.

_ ez amademe, tinê dê xatira xwe ji hevalan xwazim. Min çu nîne kar bû bikim. Supas bo harîkarîya te.

_ supasî pê nevêt. eve karê mine. Tu dizanî te parên min yên gelek heyva nedayne?!

_ min jibîr nekirîne. Tu seruberê min baş dizanî. hîvîye bêhnate ya fireh bit.

_ dê da em jivêrê derkevin. em dê pitir axivin.

Kete birex polîsekî ve. Qesta zîndana wê kirin û tişten xwe lêkdan. Li dor xwe zivirî. Çavê hemûyan li bejna wê bû.

_ gelî hevalan. Raste em gelek pêkive neman. Bixatira hewe. Supas bo mêvandarîya hewe .hîvîdarim hûn jî zû jivî cihî derkevin.

Dûsêyeka qesta wê kirin.

_ dê kîve çî?!

_ ez dê çime derê. ez azad bûm.

Êkê dest da pirteka kaxezê, jimara telefona xwe li ser nivîsî.

_ ez jî di van rojan da azad bim. Peywendyê bi min bike. Başe. Kaxeza wê jê wernegirt.

_ bibore, min heval yê hey, min biçûkek yê hey. ez ne leşfiroşim.

Yadî, her zû pirteka kaxeza amade kirî kire di destî da.

_ guhê xwe nede wê dehemen pise. Were nik min. em dê pêkive kar kin. Leşfiroşî bila bo wê qebê bit.

hemû pêkive kenîn. Tijî zîndanê deng bû.

Li berê zîndanê. Li pişt xwe zivirî.

_ ez ne pêdivî harîkarîya te me, supas bo tejî.

Destê xwe bilind kir.

_ bixatira hewe.

Tijî bi dûv ra kenî û deng bû.

_ em dê her êk bînin.

_ Nürnbêrg biçûke, dê her pêdivî me bî.

_ heker tu maye bê xudan, were senterî dê min bînî....

Kete berahîya polîsî. heta ber dergehê serekî yê girtîxaneyê. Polîsî xatir jê xwast. Kete ber tenişta parêzerê xwe û çûne derê..!

15

Nürnbêrg...

Sal: 2009

heyv: Çirîya êkêye.

Roj: 27 heyvêye Dem: Nîv şeve.

Cih: Dîskoyeka pirî mirove.

Sivêtlana, ya nîv rûse. Wek lêboka li ser depê dîskoyê li ber mezîkeyeka rosî ^ê xwe yê biçûk dileyzînit.

Tijî doran zirtolazin. hemû yên bo hejandina memkên wê desta diqotin. Wek gelek şevan, didanên hemûyan tîj kirin.

Tijî berpên wê pare kirin.

Geleka, jimareyên telefonên xwe li ser parên kaxezî nivîsîn û kirine dinav memkên wê da.

Bidest qotaneka bihêz. Sivêtlanayê leyzoka xwe bi dawî îna.

Geleka xwe havêtine ser depê dîskoyê. Gelek digel çûne jora wê ya taybet. Gelek denga gotin:

_ sivêtlana, were ,ez li benda teme.

_ sivêtlana, tu mêvana minî.

_ sivêtlana, tu bo minî.

Dergeh li xwe girt. Guh ne da kesê. Bersiva kesê neda.

Tinê li dûv dengê xudanê karî kire xar..

_ sivêtlana destxoş. Qesta cihê aman şûştine bike. Piştî aman şûştine. Cihê destava paqij bike, û paşî hola serekî ji bîr neke.

Sivêtlanayê dem nebû, bêjit bila. Tinê serê xwe di hejand..

Jiwî karî, bû yê dî. heta lê bûye berê spêdê.

Li berê spêdê, wek hemû serxoşa, dîsko dihêla. Ji wastîyanê nedşîya biçite mala hevala xwe. Li ber dîwarê dîskoyê dinivîst.

Livan welatan. Cihên tena dikêmin. Serxoşan xew lê dikire tirs. hêdî hêdî, qesta mala hevala xwe kir. her liber derî, xwe havête ser cihekî û dinivîst.

Roja dî, êvarî li dengê telefonê hişîyar bû.

_ helo?

_ helo, sivêtlana. ezim... ez azadim.Tu çewanî? Başî?

_ supas..

_ tu nedîyarî? Çi dikî? Li kîvey?

_ wek hercarim. Çu tişte nû nîne.

_ boçî telefona te girtîye?

_ ez kar dikim.

_ kar?!

erê.

_ karê çi?! Û li kîve kar dikî?!

_ bibore ,ez neşem di telefonê da bas bikim.

_ başe. Tu nihu li kîvey? Min divêt te bibînim.

_ ez ya li mala hevala xwe, tu dizanî li kîveye.

_ eve ez hatim. Tu amadey?

_ erê... Lê?!

_ lê çi?!

_ min mereqa çu tişta nîne .ez neşem ji wasitîyanê baxivim.

_ tu neaxive ,ez dê bo te axivim. Te çu nevêt digel xwe bînim?!

_ ne, supas.

_ bîreyek? Votkayek ?!

_ nene, dilê min yê ji hemûyan reş bûy.

_ ma tu li kîve kardikî?

_ carê were, paşî dê bi te bêjim.

Piştî demek! kurt. Tirumbêla wî li ber dergehê mala hevala sivêtlanayê rawistîya.

Sivêtlana li hîvîya wî bû. Dergeh vekir. Dêmê wê yê zer û wastîyay, kete hember dêmê wî yê geş.

Sivêtlana kire dinav sîngê xwe da û givaşt.

Çavên wan ketin êk. Çavên wî tijî mê bazî bûn. Çavên wê tijî xew bû.

Devê xwe havête devê wê. Berî wek her car, destê xwe bibite paxlên wê.

Destê wî girt. Keşa nik tirumbêlê ve.

_ ne demê van karane, dê êk me bînit.

her êk çû cihê xwe. Dinav tirumbêlê da. Sivêtlanayê, lêvên xwe bo maçkirinê amadekirin.

Maçeka bi lez dayê û xwe dinav cilkên xwe da kire qormik. Karê xewê kir.

_ ez gelek ya ji xewa tirumbêla te xerîb bûym.

_ te xêre? Tu ya wastîyay?

_ here cihekî da em bi dilê xwe baxivin.

Tirumbêl, beref cihê hercar hajot. Li ber lêva cadê rawistîya. herdu peya bûn.

Destê sivêtlanayê girt. Qesta wê daristana tarî kirin. Li ser qormê dareka birî rûniştin.

_ dê bêje? Tu çi kar dikî û li kîve?

_ ew ne giringe. Ya giring, ez bi çendê kar dikim?!

_ ne ne,cihê karî û xudanê karî bo min ji bihayê karî giring tirin.

_ bote dibit. Lê bo min tinê pare giringin.

_ ev cara êkêye tu hosa bêomêdî behsê para dikî.

_ eve rastîye .ez pêdivî parame.

_ pare ne hemû tişte.

_ bo min, man û nemane. Parên parêzerî, yên polîsan, yên sizay, yên te û bo nanî û bo nivîstinê û bo jîyana rojane û, û, û...

_ wesa dîyare tu amadey bo para xwe berze bikî?

_ ez çucar bo para karên xirab nakim. Lê ez neşem bêy pare bijîm.

Berê xwe da çavên wê yên biçûk. Milên wê girtin, keşa bi nik xweve.

_ bo min rastyê bêje. Tu çi kar dikî?!

Serê xwe şor kir, tijî navçavan bişkurî bû, her zû bêomêdyê cihê bişkurînê girt.

_ ez amanan dişûm. ez cihê destava paqij dikim.

_ eva ne kêmasîye..

_ û li rojên dûmahîya heftîyê, ez li dîskoyê kar dikim.

Tijî dêmê wî hêbetî bû.

_ li dîskoyê?!

_ erê, li dîskoyê.

_ tu çi kar dikî?!

Nevîya çavên wê bikevne çavên wî. Berê xwe da kûratîya daristanê. _ semayê.

_ çi?! Semayê?!

_ erê, bidîtina te kêmasîye! Mane?!

_ ê.. Niza.. Lê..?!

_ çîye?! Tu bo çî lal bûy?!

_ lirdîskoyê ?!

Yarî bitilên xwe kirin, serê xwe bilind kir.

_ eve ne keşeye. Keşe ,ez li van hemû cihan bireşî kar dikim. Min mafê karî nîne.

_ ew jî keşeka bê çareye.

Destên xwe bilind kirin, herweku, bo xwe duaya ji xudê dikit.

_ min çu çare nînin. Min çu helbijar nînin.Karê reş, yan girtîxane.

herdu bê deng bûn. Dengê firîna hindek çûçkan hişen wan komkirin.

Sivêtlanayê berê xu da navçavên azad.

_ çîye? Xemên min tu nemêr kirî?! eve cara êkêye, li cihekî hosa tu dihêlî em baxivin. Êkser te cilikên min jiber min dikirin, te nedihêla ez baxivim, heta te xwe tena dikir, paşî te pirsîyara halê min dikir?!

Berê xwe da çavên wê yên mê, hêşta tijî xewin.

_ min nevêt dilê te bihêlim. Te got ez yawastîyay me ,em çu nakin.

_ min hercar we digot. Lê binê te çu ezmanan nizanit.

Destê xwe bire navrana wî.

_ te xêre !?eviro tu yê nivîstî?!

Destê wê girt, kire dinav rûsatHyê da.

_ yê li hîvîya binê te, da mêvan kit.

Kenîya wê jikûratîya dilî derket. Serên xwe dane êk. Devê xwe bi devê wê vena. Cilkên wê kitkite berdane bin pên xwe. Pişta wê da qormê dareka mezin. Xemên xwe ü yên wê berdane ser sîngê wê yê nazik.

_ ez gelek yê jite xerîb bûym.

_ tu direwa diki. Dema te gan divên tu pirsîyara min dikî!

_ bawer bike, min gelek caran telefona te dikir. Lê telefona te ya girtî bû.

_ tu dizanî ez li kîve dinivim? Tu boçî ne dihatîye cihê min?!

_ min nedivîya bo te areşa çê bikim.

_ tu pêdivî min nebûy.

_ bawerbike ,ez bo te dîn û har bûm.

_ direwe.

_ bawerbike.

_ hêdî.. Te ez kuştim.

_ ez jite têr nabim..

16

Nürnbêrg...

Sal: 2009

heyv: Çirîya duwêye.

Roj: 2 heyvêye.

Dem: Şeveka sare.

Cih: Joreka biçûke, li pensyoneka erzan. Piştî azad ji şerê evîneka dijwar derketî. Piştî herdwa alayên spî bilind kirîn.

Jorbê ding bû.Azad rûnişte ser texî birex kelexê rûsê sivêtlanayê ve. Destê xwe li ser pişta wê ya rûs gêra, pişta wê perxand.

Tilên xwe gehandine kemaxên wê. Yarî pê kirin. Perasyên wê

hijmartin. Milên wê givaştin. Tilên xwe bo pora wê kirine şe. Tijî şaı^n mejîyê wê xew bû.

_ sivêtlana ?!

Bêy lê bizivirt, bêy ji nav hizir û xew û cihê xwe derkevit. Wek nivîsitîya.

_ belê? Bêje.?

Destê wî yê şwîm, gehşte ser herdu hêkan.

_ eve çend sale em êk dinîyasin?!

Serê xwe ji nav xem û xewê bilind kir. Kete ser tenişt^ Sîngê wê ji nav destên wî derket. Wek du hinarên kerik xûya kirin.

_ boçî?! Te boçî ev pirsîyare kir?!

Destê xwe yê xwhday, carekadî havête hinarên sîngê wê.

_ eve cara êkêye, tu telefona min dikî ji bo sêksî. hercar min hizar hîvî dikirin, heta me karek dikir!

Careka dî serê xwe berda ser Balîfkê xeman. Çavên xwe niqandin. Bê deng bû.

Destê azad ji sîngî vebû, kete ser milan. Yarî bi pora wê ya zer kirin.

_ çîye? Te çu bersiv nînin?!

Dengê wê wek nivîsitîya hat.

_ ez pêdivî te bûm. ez jî mirovim, min jî hest û vîyanê hene, wek te!

_ dîyare hevalê te tu hêlay?!

Rast rabû ser cihê xwe. Wek biçûkeka rûs, birex ve rûnişt.

_ ew bênamûstirîn mirove .ew ne mirove .ew jin perêse.

Çav li azad zîq bûn. Berê xwe da dêmê wê. Tijî kerb û kîne. Berî çend rojan, wek aşiqeka herzekar, pesna wî dikir. Digot: ew hemû jîyana mine .ez jibo wî dijîm.. Devê xwe havête devê wê.

_ çi bûye? Te çi jê zanîye?!

Wek pîrejneka xudan serbor. Tila xwe dana ser sîngê wî.

_ tu dizanî wî çend heval hene?! Tu dizanî wî çend qehbe hene?!

Wek bêomêdîyekê dêmê wê nexşand.

_ geleka digotine min, ew jin perêse ,ew qehbeçîye. Min bawer nedikir.

Serê xew şor kir. herweku digel xwe daxivit.

_ heta min bi çavên xwe dîtî.

Pistpista wê biser diket. Gazinde bo gîyanê xwe dikirin.

_ bênamûsî, şeş heval hene. Şeş jin hene. Digel şeş jinan dinivit. Yarîyan bi şeş jina dikit. Şeş mirovan dixapînit. Şeş mirov. Yan jin

ne mirove ?!

Berê xwe da enîya azad. Da bersiva pirsîyara xwe bizanit.

Azad ageh ji çu nema bû. Di nav hiziran da berze bibû.

_ çîye? Tu bo bersiva min nadî?! Jin mirove yan tinê ji bo ganan peydabûye?!

Azad hişîyar bû, zanî sivêtlana pêdivî wîye.

_ jin dayka hemû mirovaye.Jin û taybet sivêtlana dilê mirovayetîyê ye.

her weku agirê dilê wê aveka tezî bi serda kirî. Carekadî, xwe dirêj kire ser cihê xwe.

_ sivêtlana.. Min çend caran digote te wî tu nevêy, wî leşe te divêt. ew yarîyan bite dikit.

_ min bawer nedikir. Min digot te jiber xweye .her êk ji me, wesa hizir dikir, ew yarê wêye .ew dê bite mêrê wê.

_ tene gote min?! ew çi kese ?ew kîye? Te hosa ji dil vîyay?!

Bê deng bû. Çavên xwe niqandin. Nedivîya azad çavên wê bibînit. Wek miroveka şerim kirî.

_ xezûrê min bû.

Azad nevîya bawer bikit.

_ çi?!

Dengê xwe bilindtir kir.

_ babê mêrê min bû. Bapîrê kurê min...Te nîyasî?!

Azad wek mendehoşan got:

_ xezûrê te?! Babê mêrê te?!

Bêy baxivit, serê xwe hejand.

_ bapîrê kurê te? Bibû yarê te?!

_ erê...

Azad, wek dîna, destên xwe dilivandin.

_ ew çewa dibit?! Te çewa qebûl kir?! her weku karek asayî.

_ min gelek jimêje hez jê dikir. Lê wî jiber kurê xwe ez hêlam. Azad bersiv da.

_ piştî kur çûy, ew hate meydanê!

Sivêtlanayê zanî, ev kare ne bi dilê azade. Divîya hindek hêceta bigirt. Azad rê nedayê.

_ ew çend heyv bûn tu di gel xezûrê xwe dijîyay? Tu digel wî dinivîstî?

Axivtina wî birî.

_ erê... Min divîya şû pê bikim.. Bibime jina wî.. Pêkive bijîn. Dengê wê nizim bû.

_ min ji gîyanê xwe xoştir divîya...

_ çewa dibit! Tu şû bi xezûrê xwe bikî! ey hewar...?!

_ boçî nabit? Me gelek êk divîya.

Bi pirsîyareka şêtane gotê:

_ digel te dinivist?!

Bi bersiveka sade bersiv da.

_ em wek jin ü mêran bûn... Me kar dikir jibo pêkive bijîn. Destên xwe bi çavên xwe ve şidandin.

_ wesa dîyar bû, ew li jinên biçûk û ciwan digert. hêşta azad yê dinav gê^oka hizira da berzeye.

_ ey hewar, eve hûn çi milletin?! hûn çewa dijîn?!

Sivêtlana di merema wî ne gehşt.

_ boçî?!

Azad wek dujimnan berê xwe da navçavên wê.

_ haha...! Nihu min zanî. Karê hosa li nik hewe ne didirustin.

_ karên hosa li nik kesê ne didirstin.

_ bibore, min ji dil divîya.

_ û nihu? Te çi li bere?

Xwe havête dinav sîngê wî yê rûs da.

_ ez bo te Mam.

Tirs û keyfa wî têkel bûn.

Sivêtlanayê, xwe havête ser sîngê wî, karê şerekî kir.

_ min ew hêla... Min hemû yarên wî agadar kirin.

Berî devê xwe pavête devê wî.

_ ew dê tûşî girftarîyeka mezin bit.

Devê xwe jinav lêvên wê înader.

_ tu bo min may?

_ erê... Lê!

_ lê çi?!

_ tu ne bo minî. Tu xudan jin û biçûkî.

_ nihu hemû tişta jibîr bike .ez têra te û jin û biçûkên xwe heme. Givaşte nav rana xwe.

_ dê ev şeve digel min mînî heta spêdê?

Destên wê ji kemaxên xwe sist kirin.

_ bibore, divêt ez bizivirme mal.

Di nav destan da sist bû.

_ min negot?! Tu ne yê minî.

_ dê heta nîv şev digel te bim. Ma nebese?!

_ nebese... Lê çare nîne. Dê were min gerim bike. _ dê te kime di dilê xwe da.

_ hişîyarbe, cihê jina te Namînit...

_ dilê min hindî biheşte firehe.

Şerekî dijwar dest pê kir....

17

Nürnbêrg...

Sal: 2009

heyv: Çirîya duwêye.

Roj: 28 heyvêye.

Dem: Spêdeye.

Cih: Jora dadgeha xêzanîye.

Li pişt mêzeka mezin, dadwerekê sere yê rûniştîye. Tijî li ser mêza li ber sîngê wî kaxez û ektene.

Sivêtlana, li ber sîngê dadwerî, wek zirteka ya rawistîyaye. Jikeyfa neşêt li cihê xwe rawistit. her çendekê sîngê xwe yê biçûk, bi sîngê

parêzerê xweve dişidînit û supasîya wî dikit.

Dêmê parêzerê wê, tijî hîvî û serketine.

Li rexê dî. Mêrê wê yê bitinêye. Rengê wî nişanen bêomêdîyê lê dîyarin. Axivtin jê naêt. Kes digel nehatîye.

Tinê parêzerê wî wek nesaxa li rexê dî tijî çanta wî kaxezin.

Jor bê denge .hemû dirawistîyayne .hemû yên li hîvîya birîyara dadiwerî.

Tinê sivêtlanayê, tijî bin pên wê pelên agirî bûn. Ne dişîya li cihê xwe rawistit.

Gelek cara. Dadwerî, çavên xwe lê digirine girê. Gelek cara, parêzerê wê milê wê digirt.

Qotana dilê wê, keyf ü xoşîya li benda wê, ji hemû birîyar û yasayan dijwartir bû.

Li rexê dî yê jorê. Kifêna bêomêdîya mêrê wê û parêzerê wî. Biser dengê wan kaxezên dinav destên dadiwerî da, ewên guha digezînit, diket.

Dadiwerî serê xwe bilind kir. Çavên wî bi çavên sivêtlanayê yên biçûk û tijî hîvî ket. Mêrê wê yê di nav hizira da, zer bûy.

Tila xwe dirêj kire mêrê wê.

_ te gelek belgeyên sexte û gelek gotinên direw, li vê dadgehê kirîne.

Jiber van egeran, bo me dîyar bû sivêtlana ya saxlem û aqile. Çu karên xirab nakit. Vexwarinên kihulî zêde bikar na înit, wek te û parêzerê te gotî û dişet kurê xwe bi dirusitî xudan kit. Lewa me birîyar da...

Çavên hemûyan zîq bûn. Devê sivêtlanayê beş bû.

_ birîyar.

Kaxezek jinav ekteyekê îna der.

_ sivêtlana mafê xodankirina kurê xu, saşa heye .ew mal ü xanî yê wan yê berê. Bû sivêtlanayê û kurê wê saşa dê mînit.

Sivêtlanayê, neşîya xwe pitir bigirt. Kire hewar û keyf. Tijî jorê deng û qêrîyên wê bûn.

Diber ra supasîya dadiwerî dikir.

_ supas... Gelek supas..

Dadiwer, lê xurî.

_ hişbe.. Bê deng be ^şta birîyara dawîyê ne hatîye dan.

_ bibore.. Bibore...

Wek biçûkek li hîvîya yarîyeka xoştivî bimînit. Berê wê ma li devê dadiwerî.

Dadiwer zivirî kaxezên di nav destan da.

_ birîyar.

Berê xwe da dêmê sivêtlanayê.

_ ew mala berê hûn pêkive lê dijîyan. Nihu dê bo sivêtlanayê û

kurê wê saşay mînit.

elêkis, mêrê sivêtlanayê, yê berê maf nîne digel wan bijît. Maf nîne bêy zina polîsan seredana wan bikit.

elêksî maf heye ,her çend roja kurê xwe saşay bibînit û bibite mala xwe. Divêt li ser vê çendê digel sivêtlanayê û polîsan rêk bikevin.

ev birîyare ya dawîye.. Kesê maf nîne daxwaza dadgeheka dî bikit. Tinê li demê peydabûna hindek belge û pêzanînên nû dadgehe dê hête dubarekirin.Birîyar bidawî hat.Li ser polîsan êkser vê birîyarê bicih bînin.

Dadiwer rabû ser xwe. Dadgeh bikeyf û hewarên sivêtlanayê bidawî îna...

18

Nürnbêrg...

Sal: 2009

heyv: Kanûna êkêye.

Roj: 2 heyvêye.

Dem: Şeveka sare.

Cih: Mala sivêtlanayê ye...

Li ser textê sivêtlanayê yê nivîstinê, herdu dirûsin.

Piştî şerekî evînê yê dijwar, herdû wasitîyan. Ketine ser pişte. Çavên wan bibanê jorê ve zîq bûn. Xewê digel hizira, leşen wan xav kir.

Kurê sivêtlanayê, yê bi rex dayka xweve nivîsitî.

Jor bê deng bû, bêhna leşen wan tijî jorê bû. Berî dinav pêlên xewê da berze bibin. Kurê wê xwe qolpande ser teniştekê. herdu jinav xew û hizira hişîyar kirin.

Bi lez leşen xwe yên rûs veşartin. Serma tijî hinavên wan bibû. Xwe nêzîkî leşe wî kir.

Germa dile wî, agire şerekî nû hilkir.

Piştî ala bilind kirîn,piştî wastîyayn.hizirên wê,cihê hestên wê girt. Bi wê rûsatyê ve rûnişte ser textê xwe yê sar.

Berê xwe da azad, leşe wî yê gewir, destê xwe dana ser sîngê wî û perxand.

_ heta kengî em dê hosa jîn?!

Leşe azad yê xave. Xew û wastîyanê, şanen mejyê wî yên nivandîn. Bidengekî nîv nivîsitî..

_ çewa hosa?!

Sivêtlanayê, nînukên xwe disîngî da çiklandin.

_ hosa bidizî ve!

Azad neçar kir, serê xwe bilind bikit. Çavên xwe vekirin. Memkên sivêtlanayê wek du zêrevanan li hindav serî, dêmê wê di veşart.

Destê xwe dinîva herdu memka ra bire rûyê wê.

_ boçî?! Ma çi bûye?

Xwe dirêj kire ber tenişte. Milê wî ma di navbera memkên wê da.

_ tu xudan jin û biçûkî, dê her rojekê min hêlî û çî.

Destê xwe bire bin gerdena wê, bo kire Balîfk.

_ ez te nahêlim. Jin û biçûkên min, mayê xwe dijîyana min nakin, wan ageh jimin nîne.

Wek biçûkeka nazidar.

_ pa heker carekê zanîn?

_ ne tirse, jina min ya hejare. Gelek bawerî bi min dihêt.

_ heta kengî? Çend salên dî?

Devê xwe havête devê wê yê biçûk.

_ heta em pêkive di mirin.

Wê jî devê xwe havête devê wî.

_ min divêt tu hindek şeva li nik min bimînî. Sebira min bitinê nahêt.

_ ez ditirsim hevalê te bihêt.

_ hevalê min çû. Min bê hîvî kir.

_ ez behsê xezûrê te dikim.

_ min ew jî kire der. Tinê wî divîya yarîyan bi min bikit. Divîya herçend şeveka li nik min binivit, xwe têr bikit û qesta jineka dî bikit. ew jin perêsê pîs, min jibîr kir.

Azad divîya cihê xwe xoş kit. Divîya bizanit ka kî dirêya wî da maye.

_ û mêrê te?!

_ ew ji jîyana min derket. Wî hevaleka dî ya hey.

Xwe pitir nêzîkî leşe wî kir.

_ tinê tu dinav dilê min da dijî. Tinê tu bo min may.

Serê xwe dana ser sîngê wî.

_ lê niza heta kengî?!

Serê wê bilind kir. Maçek li enîya wê da.

_ wek min gotî, heta mirinê.

Bi du çavên mê..

_ heker raste, tu ev şeve ji ber tenişta min naçî?!

Dest da telefona xwe ya berükê. helo?

_ helo... ezim, ez ev şeve nahême mal. Karek fer bo min çê bû.

_ karê çi dilê min? Te ez tirsandim?!

_ netirse! Dê di gel hevalekî çime bajêrekî dûr. Dibit em ev şeve negehin bizivirîn.

_ dê bila gîyanê min, ageh ji xwe hebe.

_ çavê biçûkan maç bike.

_ em hemû çavên te maç dikin. em dê li hîvîya te mînin.

_ heta sube...

_ heta sube.

Berê xwe da çavên sivêtlanayê. Sivêtlana wek mendehoşan guhdarî dikir.

_ eve ez li ber tenişta te Mam.

Sivêtlanayê çav lê zîq bûn.

_ te çi gotê?!

_ ez dê li ber tenişta te heta spêdê nivim. Nene ,ez dê li ser sîngê te nivim.

_ ka bo min bêje! Te çi direw bo jina xwe kir?

_ direw?!

_ erê direw. ez bawernakim te gotibite jina xwe,ez dê li ber tenişta sivêtlanayê nivim!!

_ ne.. Min wenegot. Min direûeka biçûk kir.

_ direw,her direûe... Çi biçûk çi mezin.

_ ya giring, min razî kir.

_ hûn nêr, dê dinîyayê gorî binên xwe kin.

_ binên me gorî binên hewe bin.

Xwe havête ser sîngê wê yê rûs.

Jiber kenî û yarîyên wan. Kurê wê, dinav cihê xweda xwe qolpand. herdu bê deng kirin.

Piştî demekî kurt, şer dijwar bû, heta berê spêdê berdewam bû

19

Nürnbêrg...

Sal: 2009

heyv: Kanuna êkêye.

Roj: 28 heyvêye.

Dem: Nîv şeve.

Cih: Mala azade.

Li nîva jora mêvana, pîyase dikir. Di nav hizira da berze bibû. Ageh ji dem û cihî nebû. Gelek caran dengê wî bilind dibû.

_ ka tu sivêtlana?!

Xew ü wastîyanê, pîstê wî zer kirbûn. ew çend roj bûn xew nêzîkî çavên wî nedibû. Wê şevê, agirê dilê wî geş bibû. hizirên wî aviz bûn û zan.

Ne dişîya li cihekî rûnit.. Ne dişîya digel kesê baxivit.hizirên wî bûne axînik û deng.

_ tu li kîvey? Çi li te hatîye?

Dilê wî bersiva hizirên wî dida.

_ dibit zivirî bite mosko.... hizira tirsa wî zêde dikir.

_ dibit mêrê wê dirbek lê dabit! Yan...?! hizir û dil dibûne heval.

_ ey hewar... heker wesa bit! Dê çi hête serê min?!

Dilê jar, dikire hewar.

_ katu sivêtlana? Çi li te hat? Tu kîve çûy?

Mejî dikire hewar.

_ te ez dîn kirim... ez neşem hizira bikim... Ka tûüü?!

Destê xwe bi serê xweve şidand. hest dikir, mejîyê wî yê ron bûy û dê diguhada şorbit.

Dil kete tirs ü gomanê.

_ heker tiştek lê hat bit? heker hat bite kuştin?! hirza wek polîsan bersiv da.

_ dê polîs dûvçûnê kin. ez dê bisanahî aşikira bim. Tijî hemû kun ü qolaçên mala we şûn til û şûn waren minin.

Çu cih nînin ez deh cara lê ne rûniştîm.

Dil ji tirsa bû volkan.hizir bûne dadiwer.

_ dê min keşne baregayê polîsan. Dê hizar pirsîyaran jimin kin. hemû goman dê li ser min bin. Kesê hindî min seredana wê nekirîye. Dibit ez berî çend çirkekan ji mala wê derketbim!

Dê bo çend rojan min hêlne girtî.

Dilî neşîya xwe pitir bigirt.

_ ey hewar.... Dê bi me pêtirankê hevalan. Dê mala min wêran bit. Dê jina min ture bit. Dê kerbên biçûkên min jimin vebin. Dê jina min çit.

hizira xwe kire xoş mêr.

_ nene, jina min bo karekî hosa min nahêlit. Dibit hindek dil giran bibit. Dê li min borit.

Dil hate meydanê.

_ heker jina min ez hêlam?!

hizira bersiv da.

_ mafê wêye min bihêlit.

Dil tijî xwîn bû.

_ heker ez hêlam, dê çewa jîyana min berdewam bit?! hizira, hizirikir.

_ heker digel min ma? Dê çewa berê xwe dime çavên wê?! Dê çi bêjime biçûkên xwe? Dê çi bêjime mala xwe?

Dilî xwe kire dadiwer.

_ çi jite kêm bû? Tu li çi digerîyay?

Divê danustandina, hizir û dilî da. herdu ne gehştin çu armancan. Şer berdewam bû. Leş wastîya. Rê li ber hizir û dilî hatin girtin. Deng ji gewrîya wî derket, jin ji xewa giran hişîyar kir...

_ tu li kîvey sivêtlana?!

Bi cilkên nivîstinê ve, jina wî kete bersîngê wî yê tijî tirs û xem.

_ spêde baş...

Cilfek vê ket. hest kir, ew pirsîyar û gazinde û axivtinên wê sevê hemû gehştîne guhên jina wî.

Rengê wî spî bû, axivtin jibîr kir.

Jina wî zanî tijî dilê wî tirs kir.

_ te xêre? Wesa dîyare tu nenivîstî?!

hizirên xwe kom kirin.

_ a? Çine, çine .ez pîçek yê nesaxim.

_ nesax?!

_ erê.

_ nesax di nav nivîna da dimînin, ne heta berê spêdê dihişîyarin û hizira dikin.

Destê wî girt. K^şa ber sîngê xwe.

_ te çîye ?eve çend roje, tu ji mal dernakevî, tu naçîye karî, naçîye nav hevalan. herdem barê te yê girane .hizira dikî. Û..

_ bibore dilê min...Bawer bike çi nebûye.Tinê serê min yê mijûle... Nebêje mijûlî çîye. Jiber ez jî nizanim mijûlî çîye.

Dibit jibê karîyê? Dibit ji wastîyanê bit? ez jî nizanim jiber çîye?!

_ her çende te ez razî nekirim. Lê xudê xêr kit.

Berê xweda çavên wê.

_ dê nivî? Yan tu yê birisî?

Divîya bela wê ji xwe vekit.

_ ez mirim ji birisa.

_ dê here aveka sar li leşe xwe bike. Da hişen te bêne serê te .ez dê bo te xwarinê amadekim.

Jina xwe kire dinav sîngê xweda û givaşt. Devê xwe dana ser enîya wê. Maçek bi lez lê da.

Nevîya çavên wê bi kevne çavên wî.

Qesta serşûye kir. Dergeh girt, cilkên xwe kitkite jiber xwe kirin. Leşe sivêtlanayê yê zarokînî, kete beramberî çavên wî. Cilkên wê dibernebûn.

Wek hercar, berî silavê, devê xwe havête lêvên wê û bire xwarê. Gerden alîst. Serê memkê wê yê biçûk devê wî gezand.

Ava gerim leşen wan kirine êk parçe. Şer digel şirka avê têkel bûn. Dengê wî bilind bû, leşe wî xav bû. Pişta sivêtlanayê bi sîngê wî ve gerim bû. Bi qêrîeka sinêleyî, kete ser çokên xwe.

Jin, gelek li hîvîya wî ma. Dergehê serşûye vekir.

_ çi li te hat? Xwarin amadeye.

Çavên xwe vekirin, sivêtlana berzebû. Destên xwe ji navpên xwe vekir. Bêhna wî sist bû.

Carekadî, hindek ava sar bi ser leşe xweda berda û der ket....

20

Nürnbêrg... Sal: 2009 heyv: Sibate

Roj: Roja bîrewerîya daweta wane.

Dem: Êvareka direnge.

Cih: Mala azade.

Pazde momên biçûk, li ser sîngê kêkeka mezin dihilin.

Du kur... Du kiç, wek bilibla li dorên wan stiran û dest qotanê bi pazdesalîya dewata dayk û babê xwe dibêjin.

Barana keyf û hîvîya ji dêmê wan dibarit.

_ cejna şaeyîya we pîroz bit....

Jîyekî dirêj dixwazin....

Pêkive pîrukal bin....

heta hebin her bikeyf û xoşî bijîn

Kurê biçûk bêhna wî teng bû, yê bi lez bû kêkê ker kit.

Kurê mezin, wêne digirtin. Dayka xwe da ber sîngê babê xwe.

_ bike kenî... Dê ev wêne gelek ciwan hêt.

herdu kiça,wek pelatînka xwe xemlandibûn û stiran digotin, dileyzîn.

Mozîk bilind kirin, dest qotan zêde bû.

Çavên wan ketin êk. Diziviroka bîrewerîyada berze bûn.

_ te ez fêrî evînê kirim.

_ tu bi xwe evînî.

_ te ez ji dil vîyayme? Yan...?!

_ yan çi? Ma ji te ciwantir û şirîntir li dinîyayê hene, da dilê min bivên?!

Dengê kurê biçûk, jivanê wan yê nepenî aşkira kir.

_ bo min kêkê... ez neşem xwe bigirim.

Dengê wî yê bilind û gazindên wî yên çivêl. Neşîyan çavên wan yên tijî vîyan jêkve bikit.

Kurê mezin hest kir, dayk û babên wî, yên dinav tura evînîyê da mayne asê.

Devê xwe bire bin guhê birayê biçûk.

_ hişbe, ne demê kêkê ye.

Dest qotan û stiran, di gel mozîkê har bûn.

Neşîya xwe li ber çavên wê yên reş bigirt.

Destên xwe havêtine rûyên wê yên geş û spî û keşane nav devê xwe.

Berî her çar biçûkên wan desta bo biqotin. Berî herçar biçûkên wan li dor wan stiran û leyzokê bikin...

Zenga dergehê mala wan lêda.

her çara pêkive qesta dergehî kirin. her êkî di serê xweda hizir dikir. eve mêvanên dayk û babên wanin. Yên hatîn pîrozbahîya wan bikin.

Bi dêmên tijî xoşî û hîvî dergeh vekirin.

Bejna sivêtlanayê kete beramberî dêmên wan yên biçûk.

_ êvar baş.

Dengê wê di serê azad da hizar cara deng veda.

Rengê wî zer kir. Gehên leşe wî xaf kirin.

Çavên wan jêkive bûn.

Jina wî qesta dergehî kir. ew dêmê zarokînî kete ber sîngê wê.

_ keremke?

_ bibore, azad li male?

ew şanen dêmê wê yên berî çend çirkeyeka digeş, çirmisîn. Zer û pêtî bûn.

_ azad? Belê yê li mal.. Keremke?

_ ez dişêm bibînim?

Azad, wek polîsên nihênî li pişt dergehî guhdarî dikir.

Neçar bû xwe dîyar bikit. Çavên wan ketin êk.

Tirs û şerim û ji destdana pêşerojê. Rengê pîstê wî reş kirin.

Berê xwe ji çavên wê yên biçûk vekirin. Êxistine çavên jina xwe yên reş.

hizar pirsîyar jê dibarîn. Neşîya bersiva çu pirsîyaran bidit. Lêvên wî wermîn, rûyên wî yên geş, çirmisîn.

Sivêtlanayê, zanî hatina wê didemekî ne asayî dabû.

_ biborin, ez nehatîme bimînim.

Destê xwe dana ser zikê xwe.

_ tinê min divîya bêjime azad. evê di zikê min da, kurê wîye. Çavê herçar biçûka û yê dayka wan kete zikê wê yê mezin bûy.

_ bixatira hewe.

Çend pêngaveka çû. Li ser milê xwe zivirî. tu dizanî dê min li kîve bînî...!

Jin hişik bû, kete ser erdî. Azad wek stûneka asm di cihê xwe da ma çiklî.

Biçûka qesta kêkê kirin. Mozîk bilind kirin, dest qotan û stiran gotin.

hemû livîn bi dawî hatin. Dema kurê mezin, pirta kêkê ya êkê kirîye dinav tilên xwe da û soz da kes berî dayka wî, tam nekte kêka pazdesalîya daweta wê....

Nürnbêrg/ 13/7 /2010

**

SIYA EVÎNE

Roman
Orfeus
Pirtûkên Mehmed Uzun:
Tu 1985, Mirina Kalekî Rind 1987
Wêne: Ingela Jondell
© Mehmed Uzun 1989
Tîprêzî: Weşanxana Orfeus
ISBN 91 87074 16 8
Orfeus Bokforlag, Vanadisvagen 18 2tr.
113 46 Stockholm - Sweden
Ji bo bîranîna YILMAZ GUNEY

Devra felekê li ser me kin e,
Bextê me reş e, kezeb birîn e;
Mesken ji me re niha nivîn e,
Binve kezeba min binve loyî loyî
Ne mar û ne saxî û ne rahet,
Talan kirine hemî ji mihnet;
Dişwar e gelek belayê xurbet,
Binve kezeba min binve loyî loyî
Emîn Alî BEDIRXAN - 190

Lî SER RÎYA KOÇA DAWÎN

1976, payiz.
Koç. Bi dû payiza jiyanf re koça dawîn. Bêdeng, bêpejn. Wext naxuye, cîh û war naxuyin. Yan jîew dixuyin, lê tevlihev. Hem ev der û hem ew der. Hem niha, hem do û pêr. Hem nêzfk, hem dûr.
Koçeke rengfn, xweş, bêdawî, bê lez û bez, bê teşqele, bê westan û xwîdan. Koçeke ji hesûdî, pexîlî, dijminahî, xirabî, kiretî, fetbazî, xwînrêjî bi dûr. Koçeke xweş h gor daxwaza dilên xweş. Koçeke mirazkirî.
Memduh Selîm beg.
Kalemêrê hêja Memduh Selîm begê Wahî koç dike. Li ser textê xwe dirêjbûyî. Çawekirî. Rûken. Lê kerr Ûlal.
Çavên wî yên stûr ewçend vekirî ne ku ew weke du lûlûyên stûr dixuyin. Bîbûkên reş yên çavên wî, bê hereket, h jor dinihêrin. Weke xewnekê. Rûyekî aram. Qermîçekên salan lê. Porekî spî û nîvweşiyayî. Lêvên guvaştî. Çermê vekişiyayî yê rû. Stûyê qermiçî. Merivekî kal, bi qasî mistekê.
«Memduh beg, Memduh beg...»
Ew nabihîse. Ew tu tişt nabihîse êdî, bi rê ketiye, koç dike. Li dorê, jina wî Wildan xanim û çend xort. Li ber serî jî pise pisa pîrejinekê. Pîrejin Qur'an dixwîne.
Çar aliyên dîwêr bi refên kitêban ve tijî. Kitêb, kovar, rojname û kaxiz. Li ser refina çend lewheyên zerbûyî; du sûret û du bergeh. Di navenda odê de jî ew; Memduh Selîm beg.

Ew di nav xewnekê de koç dike. Ew bi xwe, li ser cîhê xwe dirêj bûye û ber bi cîhekî nare. Lê, tişt, cfh û wextên têkel bi ser wî re tên. Ew di nav tişt, cîh û wextên têkel de koç dike. Rabirdû û niha ketine nav hev; deşt, çiya, zozan newal, daristan bi hev re bûne yek; derya û asman gihîştine hevûdu, meriv, heywan, lawir û celeb bi celeb mehlûqat reng û rûçik diguherî-nin, dikevin dewsa hev. Lê tirs tune, sarî û germî tune, heyecan tune, hîs û pejn tune. Deng jê dernakeve, ne-fes lê naçike, qîrîn jê ranabe, pîqîn pê nakeve.
Ew dere.
Deverekf rengîn. Heye ku daristaneke xweş, yan jî zozaneke hûnik e. Memduh Selîm beg li ser deverê ren-gîn. Der û dorên wî tijî kew û kevok. Ew di nav kew û kevokan de li jêr, li deverê rengîn dinihêre. Du kewên spî, li her du aliyên wî, difirin. Kew her gav nêzîkî wî ne. Reng, bask, perwaz, nikul û çavên kewan baş di-xuyin. Çavên wan weke dilopên avê zelal û xweş. Ew bêdeng difirin. Memduh Selîm beg, carina li kewa kê-leka rastê, carina jî li ya çepê dinihêre. Kewên din jî ref bi ref difirin. Reng û stûrahiyên wan têkel in. Ew difi-rin. Memduh Selîm beg jî hem difire, hem nafire; hem dimeşe, hem nameşe; hem li jêr, hem li jor e.
Lê belê, tiştê herî balkêş bêdengî ye. Hawirdor bi bêdengiyê hatiye vegirtin. Perda bêdengiyê bi ser her tiştî re hatiye kişandin.
«Memduh beg, binihêre, xortê hêja Gurgîn jî hat...»

Wildan xanim, bi hêdfka, li ber guhê wf dipeyive û destê wî yê rastê dixe nav lepê xwe û dest mist dide. Deng nagihên wî. Perda bêdengiyê nahêle ku deng xwe biguhezfnin wî. Memduh Selfm beg hem li nik wan e, hem jf na; hem dijî', hem jf najî; hem li vê dinê ye, hem jî na.

Xort cot bi cot tên û li ber serê wî rûdinin. Wildan xanim, di nav kincên xwe yên reş de, her li ser serê wî ye. Wan, xort û Wildan xanim, hêvî heye ku Memduh Selîm beg dev ji koça dilsoj berde û li wan vegere.

«Apê Memduh, bavê min, mala xalanên min û Kurdên bajarê Qamişloyê silav li te dikin û ji Xwedê şîfa dixwazin...»

Memduh Selîm beg di koça xwe de, niha jî, bajarekî dibfne. Ji dûr ve. Na, carina ji dûr, carina ji nêzfk ve. Lê ew tu carf nakeve nav bajêr. Dora bajêr bi sûran hatiye rapêçandin. Çend bircên fireh li ser sûran dixuyin. Sûr û bircên spehf û stûr. Ji kevirên reş û stûr. Hin aliyên sûran hilweşiyayî ne. Hin qulên mezin jî di bedenên wan de vebûne. Bi dû sûr û bircan re, banên xaniyên bajêr dixuyin. Çend avahiyên mezin ber bi jor, ber bi asmên hildikişin. Piraniya xaniyan bi kevirên reş hatine lêkirin. Hin jî bi kevirên spf. Li dora sûran jî hêşinahî û av dixuyin. Lê, tu tiştê jîndar naxuye. Ne meriv, ne teyr, ne masf, ne heywan û ne jî mehlûqatên din.

Bajar weke hêlekanekê dere û tê, dûr û nêz dibe. Bajar di dewsa xwe de diheze. Bajar carina mezin, carina

biçûk dibe. Ew avahiyên mezin û dirêj carina pir, carina jî kêm dibin. Hişinahî û av carina ji sûr û bircan vediqetin û bi dûr dikevin û carina jî tên pê re yek dibin. Memduh Selîm beg hewl dide ku bajêr binase, bizanibe ka ew kîjan bajar e, li kû ye. Lê nabe. Bajar jê bi dûr e.

Bi tenê bajarekî carina biçûk, carina mezin, lê bi sûr û birc.
«Apê Memduh, me kitêbên te, yek bi yek, ji nû ve, rêz kirin. Binihêre, kitêbên bi zimanê kurdî li ser van refan in. Hemû ev alî jî ji bo kitêbên bi zimanê tirkî ye. Ev çar refên aliyê çepê jf ji bo kitêbên fransizî ne. Refên mayî jî yên kitêbên bizimanên erebî, farisî, îngilizî û rûsî ne... Me rojname, kovar û tiştên din jîxistin van sandûqan. Helbet, bi dûzan.»
Memduh Selîm beg, hosteyê xewnan, di nav xewneke rengîn de ye. Koça wf di eynî wext de xewnek e jî. Lê ev xewnên niha ne weke xewnên berê ne. Berê xewnên xoftijî, xewnên malkambax şevên wî dikirin jahr. Ew di nav xwîdanê de dima û bi qîrîn hişyar dibû. Carina jî xewnên xweş bi ser wî re dihatin. Wî, dilgeş, kêfxweş û mesûd, xwe berdida nav pêlên xweş. Lê xewnên vê koça dawîn ji yên kevn pir cihê ne. Ew ne xweş in û ne jî xirab û xoftijî. Ew çawan in? Salixdan ne hêsan e. Bi kurtebirî, ew xewnên koça dawîn in.
Niha jî ew li deşteke fireh, bêser û ber e. Deşt di nav rengekî zer de ye. Aso û deşt bi hev re bûne yek. Deşt

dibiriqe û carina leylan dide. Di deştê de girên hûr he-
ne. Lê Mernduh Selîm beg tênagihê ka ew çi gir in û ji
çi hatine pê. Rengê giran, cîh bi cîh, diguherin. Gava
ew reng diguherin, rengên nû, hêdî hêdî, bi ser yê kevn
re tên û lê hukim dikin. Rengên giran weke rengên
keskesorekê dixuyin. Erdê deştê jîdiguhere. Carina ew
dibe qûm, carina giya û hêşinahî, carina zevî, carina
erdê qiraç. Ji dûr ve, li nik giran jî rawirên ecêb
dixuyin. Ew wan jî nas nake. Rawir jî, weke tiştên din,
diguherin. Ew carina dibin rawirên dirende û kerî bi
kerîdigerin û carina jîew dibin rawirên fîrende û ref bi
10

ref difirin. Di deştê de tu dar û av naxuyin.
Di deştê de tiştê herî xweş dengê musikê ye. Dengê
musikeke têkel ji dûr ve, ji ew niqteyên ku aso û deşt
bi hev re dibin yek, tê. Baş fahm dibe; deng dengê mu-
sikê ye. Lê kîjan musik? Ev yeka fahm nabe. Carina ew
bi senfoniyeke babilîska 18-an ya Ewrûpayê dişibe, ca-
rina bi straneke gelêrî ya kurdî, carina bi soneteke
xweş ya piyanoyê, carina bi musika klasîk ya erebî û
carina jî bi şi'îreke farisî. Guherfnên deştê û musîkê li
gor hev in. Ax, rengê hawirdor û rawir li gor musikê
diguherin. Lê belê, dengê musikê jî pir ji dûr tê. Yanê,
di nav bêdengiyê de dengekf weke dengê musikê...
«Memduh beg, xwe bilivfne, tiştekîbibêje, behsa ro-
jên Wanê û Stembolê bike, ji kitêbên xwe tiştina bix-
wîne, bikene, bigirî, biqîre, behsa xwişka xwe bike,

behsa rojên Anteqiyayê bike... Ji bo Xwedê tiştekîbi-
bêje...»
Maliya wî, Wildan xanim h kêleka wî rûniştiye, li
rûyê wî yê kal dinihêre û dipeyive. Çavên Memduh Se-
lîm beg jî li wê dinihêrin û lêv jî dixwazin vebin û bi-
kenin. Lê nabe. Bi tenê çavên vekirî û bi ken lê dinêrin.
«Mamo, mamo! tu min dibihîsî? Ez ji bajêr têm.
Kurdên Şamê halê te dipirsin... Iro dinya pir xweş e,
tav germ e. Ez penceran vekim?»
Memduh Selîm beg di koça xwe de pencereyek dibî-
ne. Pencereyeke pir stûr di navbera erd û asman de.
Pencere hêdî hêdî vedibe. Bi dû pencerê re deryake ze-
lal û şîn dixuye. Deryake stûr di navbera erd û asman
de. Tîrêjên tavê h ser ava zelal diçirûsin. Tu pêl li ser a-
vê naxuyin. Deng tune, her tişt di nav bêdengiyê de ye.
Ew h avê û tavê dinihêre. Ew hem di nav avê de ye,
hem jî li ser avê. Lê ji nişkekê ve, av li ber wî diqelişe û
jê coteke kevokên spî radibin û bi firê dikevin. Kevok
11

weke pembû spî ne. Kevokên xweşik, çend car, li ser
deryayê difirin û paşê jî, hêdî hêdî bi dûr dikevin û
winda dibin. Bi dû kevokan re, av dîsan diqelişe û jê
keçikeke tahzî radibe û bi firê dikeve. Keçikeke tahzî,
pir xweşik, pordirêj û bedew. Keçik şil e û tîrêjên tavê
li bedena wê ya spî dikevin û dilopên ku di bedena wê
re diherikin, dibin weke lûlû û elmas. Serê memikên wê
yên vekişiyayî dibiriqin. Bedena wê bi rengekî helesor

diçirûse. Bejna keçikê carina dirêj dibe, carina jî weke bejna zarokekî, kin. Keçik ber bi Memduh Selîm beg difîre û tê nêzfkf lê dike. Lê belê, tu carf ew xwe nagihfne wî. Ew, çend car, li dor Memduh Selîm beg, ber bi jêr û jor, xwe ba dide. Lêvên wê jî dilizîn, lê Memduh Selîm beg dengê wî nabihîse. Paşê jî, keçik, rûyê wê ber bi wî, bi paşkî difire û winda dibe.
Bi dû windabûna keçikê re, derya jî winda dibe. Naxêr, ew winda nabe, lê di derekî de xelas dibe. Dîsan pencereyeke stûr li ber Memduh Selîm beg vedibe. Pencereyeke ewçend stûr ku erd û asman jê hatiye pê. Li pey pencerê jî di nav bêdengiyekê de tişt, meriv, cîh û deverên nezelal dixuyin.
Memduh Selîm beg, ji pencerê, li wan dinihêre ku bizanibe ka ew çi ne û kî ne...
12

WELATE XERIBIYE U TAYA EVINE
TAYA

Sal 1922. Pencereyekê û merivekî li ber. Kî?
Rûyekî gulover, çavên reş weke komirê, porê kin û şehkirî, eniyeke fireh, guhên stûr, bîvileke xweşlihevhatî, simbêlê zirav û lêvên kentijî. Kî? Bejneke zirav, kincên xweş, qiraweta hewreşîmî û dûmana cixarê. Kî? Fikir û guman, bîr û şik. Kî?..
Memduh Selîm. Ronakbîrê kurd, bîrewerê gelê bindest û evîndarê xweşiyan Memduh Selîm beg. Nivîskar

û berpirsiyarê kovara «Jîn»ê Memduh Selîm begê Wa-
nî.
Belê, sal 1922, ji rojan 25 ê îlonê. Na, ne 25 ê îlonê.
Berî sê saetan 25 ê îlonê bû. Niha 26 e. 26 ê îlonê, des-
tê sibê. Galata, Stembol. Memduh Selîm beg, mêrê têr-
bejndirêj, li mala xwe, li oda rûniştinê rawestaye û li
kolanên teng yên Galatayê dinihêre. Çi diqewime?
Kurd, Tirk, gelên din, dewleta Osmanî, Babialî, Mistefa
Kemal û hevalên wî û dinya ber bi kû de diçin? Ev ge-
remola piştî şerê cîhanê dê zelal bibe? Hingê?
Berî çend saetan Memduh Selîm beg li Kadikoyê, li
mala sekreterê giştî yê rêkxistina Kurdan «Kurd Tealî
Cemiyeti» Emîn Alî Bedirxan bû. Sibê, na îro, piştî
çend saetan, kurên Emîn Alf beg Celadet û Kamuran
beg dê ji Stembolê derkevin. Ew dê herin Alemanyayê,
Munfxê. Bi dû wan re jî Emîn Alî beg bi xwe. Ew dê
jî, tevî pîrek û keça xwe, here Misirê, nik kurê xwe yê
mezin Sureya beg. Emîn Alî beg û kurên wî ku ji serok
û pêşengên tevgera kurd in, dev ji Tirkiyê berdidin.
Çidibe?
Pêlên siûdê h ser Kurdan quhpîn? Ew dîsan, weke
her carî, di bin girane û zompên qehr û kulan de man?
Marên kor, gurên malkambax û şeytanên sererd û bin-
14

erd dîsan li wan hatin xezebê? Dîsan cîh li wan teng
bû? Çi diqewime?
Peymana ku li Sevresê, 1920, hat pê û rê dida ku

Kurd jî, gav bi gav, ji xwe re dewletekê ava bikin, bû qetqetî, yanê riziya. Li dewsa wê niha peymaneke nû tê pê ku tê de behsa mafên Kurdan nabe.
Memduh Selîm Beg li der dinihêre. Asman hê jîtijî stêrk in. Stêrka Kerwankujê ji rojhelatê, li Memduh Selîm Beg dinihêre. Stêrkên Leyl û Mecnûn, yek ji rojava, ya din li rojhelatê, li Memduh Selîm Beg dinihêrin. Ew jî li wan dinihêre û dikene. Keneke kin û kurt. Di kena kurt de xem û keser dixuye. «Ma Leyl û Mecnûn, ma ev stêrkên ku bi rengê zêrîn dibiriqin, dê tu carî negihên hevûdu?» Ew li stêrkan dinihêre û weha difikire.
Sersala 1923-an. Şev. Stembol, bajarê hezar netewe-yî, hezar kulturî û zimanî kêf dike. Berf hêdî hêdîle-hifeke spî radixe ser bajêr. Zû bi zû li Stembolê berf nabare. Lê îsal berf dil heye Stemboliyan şa bike. Ku-çe, kolan, aşxane, meyxane û kerxane tijî ne. Meriv xem û derdê xwe, wê şevê, ji bîr kirine û kêf dikin. Dewr û dewran diguherin, lê jiyan jî weke her carî, bê ku li kesî guhdarî bike, diherike. Qiral, keysar û împa-rator çûn. Bijî yên nû. Agir bi xarîtên kevn ketin, ew çûn. Yên nû li rê ne, ew tên.
Kurd û welatê wan?
«Monsieur Memduh Selîm, est-ce que vous ne voulez pas un peu de vin?»
«Non, merci.»
Na, spas, Memduh Selîm Beg şarab venaxwe. Ew ji araqa spî hez dike. Masayeke dirêj, h ser her texlît
15

xwarin û vexwarin, dûmana cixare, qelûn û nêrgilê, xe-
berdan, çend Fransiz, çend Tirk, çend çerkez, çend
Kurd û Memduh Selîm Beg. Ew bi hev re rûniştine û
sersala nû pîroz dikin. Memduh Selîm Beg, wê şevê,
xwe û derdên xwe ji bîr kiriye û kêf dike.
trayyylaaaalaaaayyy... Musik, kemançe.
Musik...
Dengê kemançê Memduh Selîm Beg sermest dike, ruhê
wî geş dike. Wî ji hevalên xwe tika kiriye. Ew dê wê
şevê deriyên dilê xwe, bi tenê, ji dengê kemançê re
vekin.
Xeberdan, bi fransizî, tirkî û kurdî. Li ser her tiştî,
bi her awayî. Guh li ser dengê kemançê, serî germ û
ziman şîrin in. Memduh Selîm Beg ji cacixa li ber xwe
kefçiyekê dibe devê xwe û bi dû re, dibêje, «Mîrê min,
bi xêra çar dengan jîn hê jîjfn e; dengê dil, jin, musik û
avê.» Ew tiliyên her du destên xwe bi ser hev re dibe û
nermik nermik dipeyive. Weke her carî, porê wî dîsan
şehkirî ye; rasika por weke xêzekê dixuye. Mûjan û
qermîçekên eniyê hêdî hêdf dilfzin. Ne bi tenê serf,
herweha bfbûkên Memduh Selfm Beg jf germ in; ew
dikenin.
A votre santê, şerefinize, noş... ji bo jfneke serfiraz
û bextiyar!.. Qedeh li hev dikevin, gewrî dişewitin,
deng radibin hev. Dengê Memduh Selîm Beg, bi nermî
xwe diguhezîne Fransizê hember. «Monsieur, xweziya
me bi we. Hûn azad û xweser dijîn, we demokrasiya

xwe ji mêj ve ye aniye pê. We hay ne li me ye. Tirsa min ew e ku dûzana nû ya dinyayê piştî şer, dîsan li ser neheqiyan ava bibe. Rê divê li vê yekê were girtin. Xelkên belengaz divê li ber lingan nerin, Dîsan dinya li wan teng nebe... Prensîbên Wîlson, monsieur, prensî-bên Wîlson... ew pir girîng in.»
16

3
Eynî şev, lê ne eynî roj. Roja yekemîn ya sala 1923-an. Destê sibê. Berf hê jî hêdî hêdî dadikeve. Kuliyên gulover yên berfê ber bi jêr dibin. Memduh Selîm Beg hemû heval û dostên xwe bi rê kirin. Ew, bi seriyekî germ, ber bi malên xwe çûn. Memduh Selîm Beg jî, bi seriyekî germ, li Galatayê, ber bi mala xwe dere. Ew ji Galatayê hez dike... «Li vî bajarê(li Galatayê) hijdeh taxên muslimanan, heftê taxên Rûman, sê taxên Fren-kan, taxeke Cihuyan û du taxên Ermenan hene... Bajar û rûniştevanên wf her gav di nav kêfxweşiyê de ne...»
(*) Galata ranezaye. Galata wê şevê qet raneziyaye. Ji penceran roniya çiran dixuye.
Kêfa Memduh Selfm Beg di şûnê de ye. Her der spî ye. Ronahiya lampên kuçan diçirûsin. Kuliyên berfê di bin roniyê de weke pêtên agir dixuyin. Kulî bi ser wî re tên. Niha porê wî ne şehkirî ye, ew tev li hev e. Li ser eniya wî perçemekê ber bi jêr dibe. Kulî li ser per-çemê dihelin û weke dilopên hûr ji cênik û navbera mû-jangan re diherikin. Berf dibare, lê hewa ne hişkesahî

ye.
Memduh Selîm Beg derketiye nêçîra kuliyên berfê.
Ew h pey kuliyên berfê ye. Ew destê xwe vedike û ku-
liyekê nêçîr dike. Kulî di nav lepên wî de, bi hilmekê,
dihele. Paşê dor tê kuliyeke nû. Eger Memduh Selîm
Beg keys hebe, ew dê tu kulî nehêle, hemûyan nêçîr
bike.
Di nêçîra kuliyan de, Memduh Selîm beg, ji nişka ve
keçikeke hûr dibîne. Keçikê pişta xwe daye dara lam-
payekê. Kincine tenik li ser wê ne, hinarikên wê sor
(*) Ewhya Çelebî, sedsala 17-an
17

bûne û ew dicirife. Di destê keçikê de elbikekê û tê de
kulîlkên çilmisî. Bîrkokên çavên Memduh Selîm Beg
çend car tên girtin û vedibin. Gelo ev xewn e? Gelo ke-
çika kibrîtfiroş ya H.C. Anderson ji Danîmarkê bi firê
ketiye û hatiye Galatayê?
«Kizim, tu kî yî, tu çi kes î?» Memduh Selîm Beg bi
awakî nermik, bi tirkî, jê dipirse, «tu çi dikî h vê derê,
çima tu narî mala xwe?»
«Bi tenê çend kulîlkên min man Apo, ez dê wan jî
bifîroşim û herim mal. Bi tenê çend kulîlk Apo, bi tenê
çenddd...»
Lêv li hev digerin. Çav dixwazin bikenin lê nabe. Ça-
vên bi rengê genim. Guliyên zerik û dirêj. Di bin roniya
lampê de hinarik, gep û lêvên sor. Di bin hinarik û poz
de siya rebeniyê. Dest û tiliyên zirav û dirêj. Lê, bê le-

pik.
«Keça min, tu van kulîlkên xwe bifiroşe min. Ma nabe?» Ew destê xwe davê bêrîka paltoyê xwe û cizdana xwe dertîne. Di cizdanê de perên wî yên sê mehan hene. Perên heta meha Adarê. Ew divê sê meh bi van peran îdare bike. Pêşî hinek, paşê jî hemû pere ji cizdanê derdikevin. «Van peran bigire keça min. Ez hemû kulîlkan dikirim.»
«Apo, ev pere pir in!..»
Memduh Selîm Beg dikene, best lê rabûye, «ne xem e, keça min, tu van bigire.»
Keçik jî, h nêzîk, li Galatayê rûdine. Memduh Selîm Beg dev ji nêçîra kuhyên berfê berdide. Ew paltoyê xwe ji xwe dike û davê ser keçikê. Palto ji erdê re dere. Di destekî de kulîlk, di destê din de destê hûr û zirav yê keçikê, Memduh Selîm Beg keçikê ber bi mala wê dibe.
Li ber mala keçikê, tu deng tune. Çavên hûrik û
18

xweşik niha dikenin. Henarik, gep û lêvên sor niha bi ken tijî ne. Keçik paltoyê wî bi şûn de dide. Ew, car bi car, destên Memduh Selîm Beg radimûse, wî hembêz dike. «De here keça min, de here û bikeve nav xewa şêrîn. Bila perwazên xewê te hilgire û bibe cîhên germ û xweş... keça min, tirkiya te ne ewçend baş e, tu kî yî, dê û bavê te ji kû ne?»
« Apo em Çerkez in.»

4

Destpêka payiza 1923-an. Şerê cîhanê yê yekemîn li pey maye. Eşkere ye ku dewleta Osman-î Alî, ew dewleta bê ser û ber, têkçûye, ji hev ketiye. Serokê Tirkan yê nû Mistefa Kemal û hevalên wî ku li pey dewleteke nû ne, bi ser ketine. Ew komareke nû ava dikin û gav bi gav ber bi Stembolê tên.

Pelên daran diweşin. Tebîet rengfn e. Peravên Stembol û Galatayê rojên rengîn dijîn. Stembol reng diguherîne. Meriv, kom bi kom, dev ji welatê xwe berdidin. Keştî her roj komên merivan ji Stembolê bi dûr dixînin. Mabeyn, yanê saraya dewleta Osmaniyan bi dûr ket. Piraniya rojnamevan û nivîskaran bi dûr ketin, yên mane li rê ne. Demokrat û lîberal bi dûr dikevin. Kurd bi dûr dikevin.

Rê ber bi welatê xerîbiyê ye.

Memduh Selîm Beg?

Memduh Selîm Beg xewn dibîne. Di şeveke çiksayî ya payiza 1923-an de ew xewn dibîne: Keçikekê. Weke kulîlkên henarê rengîn û narîn. Weke şîr spî, weke xezalekê çavxweşik, weke heyva çardehê şevê awirxweş, weke hingûrekê hinariksor û weke Zîna bedew ya dastana Memê Alan bejnzirav. Cihne tenik û hewreşimî lê. Lêvên wê stûr û tijî. Rûyê Memduh Selîm Beg bi ger-

19

miya lêvan dihese. Lêvên şil ber bi çavên Memduh Selîm Beg dibin. Lêv çav radimûsin, car bi car, hêdîka ra-

dimûsin. Bi dû re, lêv ber bi guh dizivirin. «Begê min, mêrê ziravbihîstiyar... ma şev, bi tenê, ji bo xew û xewnan in? Ma çirûsk û pêtên jînê jîjê re navên? Mêrê dilpak... evîn û hezkirin divê di bin siya şevên dirêj de weke devî û dar bibişkivin.»

Memduh Selîm Beg xewn dibîne. Xewneke weha? Di van rojên qafilqeda û mahşerê de ev xewn? Li milekî ruhistîn, zebanî û şeytan, li milekî jî ev xewn...

Belê, Memduh Selîm Beg zewac divê. Xwendegeha Darulfunûn ya Stembolê û dersên felsefe û siyasetê li pey man. Memduh Selîm Begê niha şevên geş û germ divê. Şevên bi çirûsk û pêtên êgir ve tijî. Wî jinekê divê. Jineke ku weke dilopeke şîr, dilopeke xwîdan, dilopeke hêsirê çavan e. Jê re kahrikên hûr, yanê zarok, malraxistin û li qerexa gola Wanê xaniyekî spehî, biçûk û xwedî bexçe divê.

Memduh Selîm Beg pir tişt divê. Bi kurtebirî, jiyaneke nû divê. Eger rê ne ber bi welatê xerîbiyê be...

Di şeva çiksayî ya payizê de Memduh Selîm Beg xewn dibîne.

5

Hê jî destpêka payiza 1923-an e. Galata. Keştî. Baran. Meriv. Hêstirên çavan. Destmal. Dilên keserkûr. Kona sirgûniyê, kona macîriyê tê vegirtin. Şeytanên sererd û binerd di kincên serdest û karmendên nû yên Tirkiyê de hatine xezebê. Ew ketine pey kes û hêzên ku h dijî tevgera wan bûn. Li her aliyê welêt sêdar hatine daçiqandin. Meriv tên girtin û kuştin. Yên mayî

direvin.
Rehmet hûr hûr dibare. Dilop li ser kevirên reş yên
20

peravê diçilkin. Dilop diçilkin ser pêlavên Memduh Selîm Begê... Ew li pêlavên xwe dinihêre. Pêlavên nû, piştî wê xewnê, hatibûn kirîn. Ew niha şil in. Memduh Selîm Beg, nîvkenek h ser rû, li der û dora xwe dinihêre. Paşê jî li bav û xwişka xwe. Xwişka wî digirî, bavê wî kelgirî ye. «Hûn qet meraq mekin, xem mexwin... ev rêwîtî kurt e, piştî demeke kurt ez dîsan li vê derê me. Lê hûn divê hingê jî li vê derê, li hêviya min bin, hûn divê werin pêşiya min.»
Memduh Selîm Beg rêwî ye. Rê lê vebûye. Lê heyhat,.. ne ber bi qeraxên gola Wanê. Ew li ser riya welatê xerîbiyê ye. Ber bi deverên dûr.
Prensîba hezar salan bi car tê; kesên serketî yên binketî bi dûr dixînin.
«Xwişka min ya delal, bêgavmayin xirab e, qelsî ye. Her gav divê me hêvî hebe. Ev rojên reş û mûsîbet dê zû derbas bibin.»
Dûûûttt... dûûtt... wext hat. Çûyin divê. Hembêz h hev vedibin. Germiya dil diguhezin hevûdu. Hêstir ji hinarikan gêr dibin. Dest tên guvaştin. Lêv bi ken dilivin. Di destên Memduh Selfm Beg de du çante, ew ber bi keştiyê dere. Di çantekê de kinc û tiştên wî yên şexsî û di ya din de Ehmedê Xanî, Firdewsî, Omer Xayam, Montaigne, Descartes, La Fayette, Rousseau, Shakes-

peare, Voltaire; yanê rojhelat û rojava bi hev re.
«Li mal û kitêbên min miqayite bin. Ez dê vegerim,
ez dê vegerim...»
Dest hêldibin, destmalên şil hêldibin.
Av diqehşe. Keştî, giran giran, bi dûr dikeve. Baran
dibare. Hawa tarî, aso girtî ye. Li pêş, ji mij û dûmanê
pê ve tu tişt naxuye.
6
Iskenderiye. Bajarê Kavafîs. «Tu dê nikaribî welate-
21

kî nû bibînî, tu dê nikaribî deryake nû bibînî.»Kavafis
weha dinivîse. Ew niha di vî bajarê fîrawûnan de çi
dike?
Piştî şerê cîhanê
Şev. Bêdengiya destpêka 1920-an.
û dinya westiyayî. Iskenderiye di bin ronahiya heyvê
de dest bi xewa şêrîn dike. Bajar dere xew, xewa şevên
bêdeng.
Memduh Selîm Beg, bi tena sere xwe, h qeraxa der-
yayê digere. Ji dûr, ji nik keştiyan dengine tên û rona-
hî diçirûsin. Stêrk di govendê de ne. Pêlên hîsên têvel;
dûrahî, hêvîdarî, hewcedarî, rêwîtî, xerîbî, xweşî,
xemgînî... Pêlên hîsên têvel bi ser Memduh Selîm begê
re tên. Pêlên avê bi ser qeraxê re tên. Car bi car. Şeve-
reş. Pêşî tarî ye. Ew pêşiya xwe baş nabîne. Çavên wî
nikarin perda tarî ya şevê biqehşîne. Ew bi şûn de ve-
digere. Ew dê here navenda bajêr. Cîhê ku razan jê bi

dûr e.
Di kuçeyên teng û biçûk re bûrîn. Zêdebûyina rona-
hiya lampan. Meydana Munşiyê. Pêlên merivan; Ereb,
Ecem, Tirk, Ermen, Kurd, Yewnan, Ingiliz, Fransiz, I-
talî. Li her aliyê meydên devê kuçeyên teng û dîsan
meriv. Rû û rûçikên nas? Naxêr. Silaveke germ? Na-
xêr. Germiya coteke çavên dost? Naxêr. Pêlên hîsên tê-
vel û pêlên merivan bi ser Memduh Selîm beg re tên.
Xaniyên spehî yên textîn. Bi dû wan re deverên
Remle. Koşk û qesrên mezin û spehî, tê de merivine
ziktêr, halxweş û ji xerîbiyê bi dûr. Wan hay h Mem-
duh Selîm Begê heye? Ew û xewnên wan yên şêrîn. Di
xewnên şêrîn dê dengên şêrîn; gujîna avê, hûfe hûfa
pêlan, hîrîna hespan, pîrqîna keç û jinan, kalîna ber-
xan, qebqeba kewan, çîvçîva bilbilan, teptepa dilan û
nalîna bedenan. Baş e, niha kî di xewna xwe de Mem-
duh Selîm beg dibîne?..
22

Bila bajarê hozan Kavafis jê re be. Memduh Selîm
Begê ev bajar navê.
7
«AUah-û ekber, Allah-û ekber...» Ezana destê sibê.
Dengê dîkan û kûzîna segan. Memduh Selîm Beg nika-
re razê. Bîhntengî lê hatiye xezebê. Berî çend salan wî
hêvî hebû ku Kurd dê xwedî dewlet bûna. Lê niha jî
ew di nav pêlên xerîbiyê de ber bi derine dere. «Xwelî
h serê te be dinyayê, xwelî h serê te be!..» Memduh Se-

lîm Beg dide xwe, radibe û di çend deqîqan de cilên xwe werdigire. Ew dê ji oda xwe ya otêlê derkeve û here bajêr.
Kahîre.
Evîndarê Nîla delal hişyar dibe. Ro hê hilnehatiye, lê tîrêj bi rengê zîvîn li pey Nîlê dixuyin. Memduh Selîm Beg ber bi Siwarsî dere. Hembal dilezînin. Tramway xwe dihvînin. Jinên rûpêçayî di nav kincên reş de ber bi derine derin. Ew meydana Siwarsî dibihure û dadikeve kolana Qesr el-Nîl. Lampayên stûr hê jî vêketî ne. Welatê îslam, lê avahiyên Ewrûpayî. Bişûndemayin. Nezanî.
Ax nezanî!
Memduh Selîm Beg, di nav fikr û hîsên têvel de, bê ser û ber digere. Rojên Fransayê, Parîsê ne weke van rojan bûn. Ew jî rojên xerîbiyê bûn, lê ne weha. Weha nabe! Memduh Selîm Beg nikare weha weke serseriyekî li welatê xerîbiyê bigere. Tiştine dê di welêt de biqewimin. Ilam. Hingê ew dê li kû be?
Ling wî ber bi Şarî Maxribî dibe. Li aliyê milê rastê meydana Operayê. Ronahiya lampan. Erebeyên spehî. Meyxanên hûr. Bexçeyê Ozbekiyê. Li doraliyên meydên kuçeyên teng û tarî. Di devê kuçeyan de keç û jin.
23

Ling ber bi kuçeyekê derin.
«Sabah-ul xêr.»
Jin silav didin mêrê bejnzirav. Ew silavê li wan vedi-

gerîne. Ew li wan, jin jî li wî dinihêrin. Bi ken, bi dilge-
şî. Jinên nîvtahzî, jinên bedensivik, jinên pêsîrmezin,
jinên hêtfireh, jinên pordirêj. Ew li hev dinihêrin û di-
kenin. Memduh Selîm Beg ji dil dikene. Lê kena jinan?
Keneke derewîn û edetî?
«Mêrê çeleng, were em herin jor, odê kahweyekê
vexwin...»
«Na, spas. Ez dixwazim bi tenê li we û xweşikiya we
binihêrim, li dengê we guhdarî bikim... min bêrî lê ki-
ribû.»
Ew, bêdeng, lê ken li rû, hêdî hêdî li kuça teng dige-
re. Di bin siya xaniyên bi lampayên rengîn de ew li rû,
ken, por, çav, bejn, pêsîr, beden û lêvên jinan dinihêre,
li dengê wan guhdarî dike.
Belê, ew ji çar dengan hez dike; dengê dil, jin, musik
û avê. Lê ka dengê dil? Ew li kû ye? Ew dizane; dil bi
bîhna welêt û merivên welêt û bi tahma xweşiyên we-
lêt hildavê. Ka ew bîhn û tahm?
Dengê dil divê. Jiyaneke bi dengê dil divê. Cîhê ku jê
dengê dil dertê, divê. Memduh Selîm Beg cîhekî weha,
ji bo jiyînê, divê.
8
«Monsieur Memduh Selîm, me mînet e ku hûn di-
xwazin li Sûriyê bi cîh bin. Ji ronakbîrekî weke we re,
her gav, cîhê me heye. Hûn dikarin h her derê Sûriyê
cîwar bibin. Li vê derê, Helepê, yan jî li derekî din.
Hûn bi kêfa xwe ne, hûn h kû dixwazin li wir...»
«Monsieur, ez mînetdar im.»

«Bi tenê me şertekî heye monsieur Selîm; hûn divê
24

xebata siyasî nekin. Dewleta Tirk ya nû gelek zor dide dewleta Firansê da ku em rê h Kurdan bigirin ku ew li ser tixûb nexebitin. Bawer bikin... em dizanin Kurd di çi halî de ne, lê hûn dê çi bikin! Dewletbûyin jî ne hêsan e, meriv divê her gav mafên dewletê li ber çavan bigire...»
«Oui monsieur, ez we têdigihêm.»
Memduh Selîm Beg h rûyê zabîtê Fransiz dinihêre û dikene. Ew ji kerba dikene. Ji ber bextê reş dikene.
«Dewletbûyin ne hêsan e...» Ew bi dengekî bihnd dikene.
Eger di rojên pêş de Memduh Selîm Beg keys hebe, ew dê h ser celebên kenê nivîsareke dirêj binivîse. Ev yeka pêwist e.
«Monsieur, Heleb jî ji welatê min bi dûr e. Ez dixwazim nêzîkî welatê xwe bim, li nik merivên welêt bim.»
«Hûn bi qîma xwe ne, monsieur Selîm... bi tenê me agahdar bikin.»
Memduh Selîm Beg kêfxweş e. Wî gaveke nû avêt; wî biryar da ka ew dê h kû bi cîh be. Heta ku ew dîsan bizivire welêt, ew dê h vî ahyê tixûbê, h nik hemwelatiyên xwe bijî. Serdestên Sûriyê Firansiz rê li vê yekê nagirin. Jixwe ev jiyana derbeder ya xerîbiyê dê zêde dirêj nebe. Dewr û dewran dê biguherin. Ew dê dîsan

vegere welatê xwe, nik merivên xwe yên ezîz û qedirgi-
ran. Ew dê xaniyekî biçûk li nik gola Wanê ava bike.
Stêrkên zêrhelî dê h ser serê wî re biçirûsin. Felek dê li
ber wî govend bigire. Bextê çê dê lê bizivire.
Ji kêfa Memduh Selîm Begê re payan nayê dîtin.
Dused û pênce giram fistixên Helebê. Li ser kolanên
bi kevirên spî rêveçûn. Girsa merivan. Şênî. Rûyên es-
mer, simbêlên dirêj û badayî, kiras, fîstan û qutikên di-
25

rêj, jinên rûpêçayî. Qîre qîr, xire cir. Feqîrî, rebenî,
belengazî. Parsekên h koşeyên kuçan. Avahiyên spî û
spehî.
Memduh Selîm Beg dê li Helebê, li Hotel Central
bimîne. Ew dê heval û dostên xwe bibîne, bi wan bişi-
wêre da ku li cîhekî, li Sûriyê, cîwar bibe.
Ew, rûken, h Helebê digere. «Digel her tiştî, tevî her
celeb mirdarî, qirêtî û nizmahî, dîsan jî, jîn xweş e,
dinya xweş e.»
9
kî hatiye bajarê me û bi cîh bû-
«We bihîstiye ka
ye?»
«Dibêjin, alîmekî ji Mabeynê, ji Saraya Osman-î Alî
hatiye...»
«Na, na, ne ji Mabeynê. Dibêjin ew şoreşgerekî ye,
şoreşgerekî mutexes.»
«Ne alîm, lê hozan.»

«Na, ne hozan, lê nivîkar û musiknas.»
«Ne nivîskar, lê siyasetçî...»
«Axirrr... Dibêjin, merivekî pak û rind e.»
«Belê, me bihîstiye.»
«Merivekîbejnnavîn, zirav,»
«Asîl.»
«Belê, me jî bihîstiye.»
«Nermik, rûken, xweşsohbet.»
«Dibêjin, porê wî her gav şehkirî ye, simbêlê wîzi-
rav, bedena wî lihevhatî ye. Pêlavên wî her gav dibiri-
qin. Kincên paqij û gomlegên spî h xwe dike. Saeta wî
zîvîn e, qirawatên wî xweşik û destmalên wîbi bîhna
rehanê ne...»
«Belê, belê.»
«Heval û dostên wî li bajêr hene. Li gor gotina wan,
26

ew ji araq, cacix û çerezê hez dike.»
«Ji însanan jî.»
«Dibêjin ku ew Kurd e.»
«Baş e, hingê çima ew neçûye û li bajarekî Kurdan,
mesela li Qamişloyê cîwar nebûye?»
«Dibêjin, pê re nexweşî heye. Ew nikare xwe h ber
germa havînê ragire.»
«Belê, belê...»
«Hûn dizanin ka ew her roj di saet çaran de çi di-
ke?»
«Çi dike?»

«Ew, her roj, ber bi dana êvarê, dadikeve parqa Zî-
rahiyê û h wê derê qahwe vedixwe.»
«Rast?»
«Belê, rast e.»
«Hingê, gava ew ji ber derî re, li kolanê, derbas bû,
em lê binihêrin.»
«Belê, belê, em lê binihêrin.»
«Ermenekî kal ku dengbêj bû û bi kurdî jî dizanîbû,
h ser merivên weha, straneke weha digot:
Mêro, mêro, bejnziravo
Xweziya min bi dilê teyo,
Rûgeşo, rûşêrîno,
Dilên keçên xama pê re yo...»
10
Teq, tuq; teq, tuq...
«Xwedê umrê wî dirêj bike.»
Teq, tuq; teq, tuq...
«Xwedê wî ji xirabî û pîsîtiyê bisitirîne... Xwedê
mirazê wî bîne dewsê.»
Teq, tuq, teq, tuq... weke dengê saeteke dîwêr. Ew-
çend bi dûzan, ewçend rehet. Belê, Memduh Selîm Beg
27

kuçeyên Antaqiyayê dihejîne. Havîna xweşik dest pê
kiriye. Saet piştî nîvroyê 3.45 e. Ew ji mal derketiye û
dere bexçê. Kevirên reş yên kuçeyan di bin pêlavên reş
û çermîn de deng didin.
Derî û pencere, bi hêdîka, bêdeng, vedibin. Bi qasî

bihustekê, ne zêde. Perde tên vekişîn. U çav; çavên reş, şîn, belek lê dinihêrin.
Dinya germ e, lê wî çakêt, yêlek û qirawatê xwe ji xwe nekiriye. Ev yeka ne li gor edetan e. Ne li gor edetan e ku meriv «pîrût û çîprût» bigere, li der û dora xwe binihêre, bilezîne, di rêveçûnê de bifikîne. Ne li gor edetan e ku...
«Efendiyê bejnzirav.»
«Mêrê qenc.»
Ew, serî h ber, hêdî hêdî dimeşe. Lê ew dizane, na, ew nizane, lê pê dihese ku li pey derî û penceran çav li wî dinihêrin.
Parq, bexçe. Giya û hêşinahî. Darên têkel; yên bi ber û yên bêber. Pelên hêşîn û xemilandî. Dengê çivîkan. Tava germ. Bayê sivik û hûnik. Bîhn;bîhna dar û pelan, bîhna hêşinahiyê, bîhna çêm.
Çemeke hûr û zelal h ber wî diherike. Di bin siya daran de ava zelal rengîn dixuye. Rengên kesk, şîn, gewr û zer ketine nav hev. Av reh, rêç û pelên daran hembêz dike. Darin stûr xwarî avê bûne. Dilê Memduh Selîm Begê hildavê. Hîn zûtir û hîn xurttir. Weke ku dengê avê û dengê darê digihên hevûdu, dibin yek.
Ew kursiyekê dikişîne bin xwe û li kêleka çêm rûdine. Lawikê dezgedar yê bexçê dilezîne nik wî, radigihê masayeke biçûk û tîne ber wî datîne û serê masê paqij dike. «We îroj çi divê, nêrgile?»
Ew, bi ken, li lêwik dinihêre, «La, şukran.»
«Weke her carî?»

«Belê, weke her carî.»
Bexçe tenha ye. Jin û mêrekî û du zarok li nêzîkî wî rûniştine û çay vedixwin. Du zabîtên firansizî, ji wî hinekî bi dûr, rûniştine û bi dengekîbilind dikenin. U hinek kesên din ku li bexçê rûniştine.
Lawik, di destan de misîna qahwê û du fîncan, dîsan tê nik wî. Ew fîncanekê ji lêwik werdigire. Fîncan tijî qahwe dibe. Dûman ji qahwê radibe. Ew hêdî hêdî qahwê bîhn dike, çend car fîncanê di destê xwe de di-livîne û bi dû re jî vedixwe. Oxxx... Fîncan dîsan tijî dibe. Oxxx... Dîsan. Oxxx...
«Spas.»
Di qahwevexwarinê de Memduh Selîm Beg tiştekî ku ne h gor edetan e, dike; qahwa tahl divê du caran were vexwarin, lê ew sê caran vedixwe. Qahwe divê hindik be, lê ew dixwaze ku bila fîncan tijî be.
Ew h dora xwe dinihêre. Xweşî... Zarok di navbera maseyan de dibezin, çivîk difirin û li ser daran distrên. Av, hêşinahî. Ew ji bêrîka hundirîn ya çaketê xwe pe-nûs û deftera xwe dertîne. Penûs. Penûsekî murekebî û reş, pir xweş.
Heş bi firê dikeve. Ew roj... Ew roja xweş û hêvîtijî. Ew roja ku qet ji bîr nabe. Roja ku wî û hevalên wî dest bi weşandina kovara «Jîn»ê kirin. Stembol. Şênî, heval û dost. Kêfxweşî, şahî, bawerî. «Em dê bi ser ke-vin. Em dê bi ser kevin... Iroj kovereke xweş, sibê roj jî

rojnameyeke rengîn û dewlemend... Gava em weha bi hev re bibin yek, bi hev re bin, tu tişt nikare xwe li ber me ragire. Em dê bi ser kevin.» Kurdiyê Bêtlîsî. Yanê bi navê rastî Xelîl Xeyalî. Nivîskar û zaneyê kurd. Hevalê dilsoz, merivê hêja û merd. Di destê wî de penûseke reş û murekebî. Penûseke pir spehî.
Hevûdu hembêzkirin. Hêstirên kêfxweşiyê. Best û
29

dostî. Coşeke bêhempa. Memduh Selîm Beg jê penûsê werdigire. «Ez dê vê penûsê veşêrim û vê roja xweş ji bîr nekim.»
Memduh Selîm Beg niha li bexçê Zîrahî yê Antaqiyayê rûniştiye û di nav pêlên xatiran de li penûsê dinihêre. Bi dû re, ew li ser rûpeleke vala ya deftera xwe ya biçûk, bi penûsa yadîgar, navên kitêbên ku jê re divên dinivfse. Jê re pir kitêb divên. Ma ne çêtir e ku ew kitêbên xwe jî bide anîn? Hingê karê wf dê hêsantir bibe. Ew nikare ji bo deynkirina kitêban bireve vê derê û wê derê. Belê, çêtir e ku kitêb werin. Gava roja vegerê, vegera welêt hat, ew dê kitêbên xwe, dfsan, bi xwe re bibe welêt.
Ma weha ne çêtir e?..
11
Bi qasî du mehan, bi dû wê roja ku wî navên kitêban nivisî. Eynî cîh, eynî wext. Lê çend mase ji maseya wê gavê bi dûr.
«Weke her carî?»

«Belê, weke her carî.»
Baş bû ku Memduh Selîm beg hat û li vî bajarê bi-
çûk bi cîh bû. Bajar li ser deryayê ye. Der û dora wî
xweş e û di ser de jî ew li ser tixûb e. Hewayê bajêr li
Memduh Selîm Begê tê. Ji ber ku ew li ser tixûb e, ge-
lek kes tên û derin. Xeberên Tirkiyê û welêt zû dihu-
hezin bajêr. Merivên bajêr weke hemwelatiyê wî ne. E-
det û tore wekhev in. Ziman jî ne zehmet e. Jixwe ew
hinekî bi erebî dizane... Baş bû, baş bû.
Çîve çîva çivîkan dîsan hawirdor vegirtiye. Çivîk bi
firê dikevin û vedinişin. Lê di wê navberê de dengekî...
Dengekî tîz û zirav. Vîçe vîça çivîkekê. Weke ku ew li
bin guhê Memduh Selîm Begê vîçe vîç dike. Memduh
30

Selîm Beg li dora xwe dinihêre. Vîçe vîç ji kû tê?.. Be-
lê, ji bin dara kêlekê. Di bin darê de çivîkeke pir biçûk.
Li ser darê, di nav şax û pelan de hêlfneke biçûk. Re-
bena çivîkê! Çivîk diperpite ku bifire. Lê ka perwaz?
Perwaz hê baş li hev nehatine.
«Çima tu ji hêlîna xwe bi dûr dikevî?»
Memduh Selîm Beg radibe, ber bi çivîkê dere. Vîçe
vîç. Du çavên hûrik, nikuleke rindik, pûrtên nermik.
Çivîk di nav lepên wî de diperpite. Tirs. Tirsa malkam-
bax. «Na, na metirse, ji apê te tu xirabî nayê, metirse.»
« Şebabbb...»
Lawikê çayxanê dibezîne û tê nik wî.
«Rebena çivîkê ji hêlîna xwe ketiye, ew nikare bifi-

re. Me jê re alfkarî divê.»
Lawik, pir ecêb, li wî dinihêre. Carekê li wî, carekê li çivîkê. Carekê jîli darê. «Dar bilind û asê ye.»
Yanê çi? Memduh Selîm Beg, bi ken, lê vedigerîne, «xortê hêja, em nikarin vê çivîka reben weha berdin. Ew dê bimire. Ma ne guneh e?.. Tu divê hilkişî darê û çivîkê deynî hêlîna wê.»
«Hilbikişim?.. Ji bo vê çivîkê?..»
«Belê, hilkişî... belê, ji bo vê çivîkê.»
Temaşegeh. Şêniyên çayxanê li dor wan dicivin. Lawik bêçare ye. Ew hêdî hêdî hildikişe. «Bijîxorto.»
Çîve çîv. Çepikên zarokan. Memduh Selîm Begê serfîraz û biserketî. Rûyê wî bi ken. Çivîk niha di hêlînê de ye, di stariya xwe ya germ û nas de.
Çepik, qîrîn, şahî. Lawik dadikeve. Lawikê serfiraz û rûken.
«Xortê çak, ji bîr meke; her kes di hêlîna xwe de kêfxweş û dilşa ye, çivîk jî di hêlîna xwe de...»
Şênî belav dibe. Memduh Selîm Beg li şûna xwe vedigere û rûdine, bi kêfxweşiya tiştekî rind biserxistinê.
31

12
Ronakbîrê kurd Memduh Selîm niha bûye monsieur Memduh Selîm. Monsieur Memduh Selîm yê xwendegehan. Mufetîş û mamoste monsieur Memduh Selîm. Wext lê diqulipe. Roj, meh, sal lê diqulipin. Niha payiza 1926 an e. Simbêl niha hîn dirêjtir, lêv û çav jî dîsan

bi ken in. Lê belê, di eynî wext de, bi derd û keser.
Li ser bibûkên çavên wî siya derd û keseran.
Dîsan Sûriye, dîsan Antaqiye.
Ew li mala dostekî xwe yê çerkez rûniştiye û pê re dipeyive. Hevalê wf jî, herwekî wî, derbeder e. Wî jî, di 1923 an de, dev ji karê xwe, rojnamevanî, berdaye û ji Tirkiyê reviyaye. Pêşî Lubnan û Urdin ûnihajî Antaqiya. Dostê wî... Merivekî çawan? Kirasên hewreşîmî yên çerkezan, bejneke dirêj û zirav, rûyekî dirêj û zirav û asîl, çavên xweş û bi rengê genim, simbêlên dirêj û ber bi jor badayî.
Merivekî nerm û zane. Dostekî dilsoz û dijminê dijminan.
Odeke mezin; li gor edetên çerkezan raxistî. Li ser dîwaran çend xençerên zîvhêlî ku bi awakî çaprazî hatine hildayin. Du qafên xezalan. Xalîçeyeke rengîn û çend refên kitêban. Kitêbên nerêzkirî û tevlihev. Piraniya wan kitêbên îlmî û edebî. Kitêbên têvel.
Li ser masê jî araq; araqa spî, cacixa spî û xwarinên têkel.
Wan şîva êvarê xwarine û niha jî ew qesta felekê dikin. «Mîrê min, dîsan çi bû, bi me, bi xelkên belengaz û bindest bû. Dîsan em ketin bin bêjingê.» Memduh Selîm Beg, weke her carî, tiliyên destên xwe bi ser hev re dibe û bi nermî dipeyive. «Heq, hûqûq, demokrasî û mafên merivahî tên xeniqandin, tên fetisandin... Par li Kurdistanê qetlîameke mezin çêbû. Tirkan gelek bîre-

wer, rênas û pêşewayên me bi dar ve kirin...»
Gava ew behsa par dike, ji çavên wî çirûsk difirin. Dengê wî di nav qfrîna dilê wî de difetise. Bîhn lê di-çike. Ew, kelgirî, li ber xwe, li qedeha araqê fedike.
«Di nav wan de gelek hevalên min jî hebûn. Gelek hevalên min jî hatin bidarvekirin...»
Bêdengî. Hingê bêdengî. Di şîna bêdengiyê de dengê dil û qultên ku ji gewrî dadikevin. Rabûna qedehan. Hinekf cacix. Şewata gewriyan. Dfsan qedeh. Dîsan şewat. Ji nû ve, dest bi xeberdanê kirin. Beden li vir, heş li welêt. Di çavê macîriyê de were! Derd, kul, kerb û xezebên macîriyê... û bûyerên welêt. Yek ji yekî xi-rabtir, yek ji yekî kirêttir. Bîhntengî, qedeh. Şewat. Cacix. Keserkûrî...
Le?
Trayyy... laaaa... laaayyy... trayyylaaaylaaayyy...
Memduh Selîm Beg vediciniqe. Musîk. Kemançe. Dengê kemançê. «Dengê kemançên Stradivarius... belê, ev deng, dengê kemançên Antonio Stradivarius e... Ev deng bi tenê dikarin ji kemançên wî derkevin!..»
Xeberdan tê birîn. Guh li ser kemançê ne. Çav li jor, li banê dinihêrin. Ji dengê kemançê pê ve, her deng, her pejn rawestiye.
«Memduh Beg...»
«Mîrê min, tika dikim...»
Ew xeberdana dostê xwe dibire. Beden bi hêdîka di-heze, ruh diheje. Dengê delal yê musîkê têkel e. Mem-

duh Selîm Beg xwe diêşîne ku dengan ji hev derxîne. Musîk bi dengine bilind dest pê dike û bi qasî bîskekê wisan didome, paşê ji nişka ve, bi carekê deng nermtir, pir nermtir dibe û paşê dîsan ji nişka ve dengine bilind tên. Tev h hev. Tevhhevî. Lê tevliheviyeke xweş û durist. Di nav dûzaneke hhevhatî de tevhhevî. Yanê ne h
33

gor qaîde û prensîbên kevn. Ne li gor klasîkên 1700-1800'î. Ji bervajiyê, şoreşgerî, nûbûn û nûkirina babilîska 20 an. Heyama teze ya destpêka 1900'î.
Xeberdan, vexwarin, xwarin rawestiye. Tilî, li gor musîkê, bi dûzan li ser pişta qedehê radibin û dadikevin. Trayyy... trayyy... trayyylalayyy... laaaay... Musîk weha, bi qasî demekê, dom dike. Perçeyên cihê tên ceribandin. Destên ku li kemançê dixin û bi kewana kemançê digirin, hal û hewalê kemançê dizane. Ne ewçend bi hostehî, lê dizane.
Di pey musîkê re bêdengî. Memduh Selîm Beg li dostê xwe dinihêre. Çavên wî bi ken in. «Mîrê min, ez bûm serxweş.»
«Belê, me pir vexwar.»
Memduh Selîm Beg dikene. Niha jî ji çavên wî ken diçirûsin. «Na mîrê min, ne ji ber vexwarinê ye, ji musîkê ye, ez ji ber musîkê bûm serxweş. Ji mêj ve bû ku min dengê kemançê nebihîstibû.»
Ken. «Keça min e, Mernduh Beg.» Şinginiya qedehan. «Saghginiza!..» Ji bo siheta we...

«Ez nizanim, lê dengê kemançê bi dengê kemançên Stradivarius dişibe. Ma ev kemançe ne kemançeyeke ji yên wîbû?»
«Memduh Beg, Memduh Beg... we hay ji kemançan jî heye! Rast e, gava ez di destpêka şerê cîhanê de li Italyayê bûm, min ev kemançe bi dest xist û ji keça xwe re kirî. Ji ber bextê min'ê rind, ew ne zêde buha bû jî. Tu dizanî, evîna zarokan li ser her tiştî re ye. Me bi tenê zarokekî heye. Ew her tiştê me ye...»
Zarok? Delalî? «Keça min»?
Kî? Keçikeke çawan? Meraq. Lê Memduh Selîm Beg şerm dike ku vê yekê ji dostê xwe bipirse. Ne h gor e-detan e. Lê belê, carina ji dan û standina fikir û hîsan
34

re peyv û qise navên. Dostê wî radibe pê û ji odê derdi-keve. Memduh Selîm Beg, sermest, li dora xwe dinihê-re. Dengê kemançê bû dilopeke ava hûnik û xwe berda ruhê wî yê tî û zuhabûyî.
Dinya dijîtî û berberiyan careke din xwe ber bi çav dike. Berî bîskekê keser û xemgînî, niha sermestî û serxweşiya xweşiyan. «Dilo, dilo, çi bi te diqewime? Tu çima weha xwe bi carekê dihurînî?» Ma jiyana Memduh Selîm Begê dê weha di navbera dijîtî, berberî û tevhheviyan de derbas bibe?
«Memduh Beg, keça min Ferîha...»
Ferîha.
Xwedeyo! Xwedeyo!..

Xezal. Heyva çardehê mehê. Kew. Dilop: dilopeke av, dilopeke xwîdan, dilopeke hêstir, dilopeke spehîtî û xweşî. Jiyan. Kahniya jiyanê.
Li milekî jî awirê teyrê baz.
Bav û keç li ber masê ne. Memduh Selîm Beg radibe pê. «Dengê kemança we ez sermest kirim.» Dest digihên hevûdu. Germiya bedenan digihên hevûdu. Memduh Selîm Beg bawer dikir ku keça dostê wî biçûktir bû. Lê li hember wî niha keçikeke xama, li wî dinihêre.
«Spas.»
Dengê delal xwe digihîne dilê Memduh Selîm Begê. Dil bi xurtî hildavê, ew dê ji qefesa xwe derwere. Ax dilo. Dengê dil... Dilê wî ewçend pihêt hildavê ku ew ditirse, bav û keç dengê dilê wî bibihîsin! Lêvên wî, bi ken, dihvin, -weke ku ew li pey ramûsanekê bin. Gewrî lê zuha bûye. Ew bi destan kursî nîşan dide da ku bav û keç lê rûnin.
Ew; bejneke dirêj weke mehînan, stûyekî dirêj, delal û spî, hêtên zirav û xweşlihevhatî, guliyên zer û dirêj
35

heta pişta bedew, çavên germ, şêrîn û genimî. Çavên wê; li ser riya bihuştê du derî.
«Hûn baş li kemançê dixînin.»
Keneke şermok. «Bi xêra Bavo. Eger ez îro li kemançê dixînim, ev yeka bi xêra Bavo ye. Wî ez teşwîk kirim.» Bavo jî, maxrûr, dikene.

«Ji deng dixuye,.. kemança we pir xweş e.»
Dîsan keneke şermok. «Bavo ew ji min re kirî.»
Keça bavê xwe. Delalî, delaliya Bavo!
«Ew perça ku we lêdixist, ya kê bû?»
«Ew ya Eugêne Ysaye bû. Ez nizanim baş li perçên
wî xînim, lê kêfa min jê re tê.»
«Belê, min navê wî bihîstiye. Gava ez li Parîsê bûm,
behsa wî dibû.»
Çavên delal, bi heyret, vedibin. Çav, bi qasî bîhnekê,
li çavên Memduh Selîm Begê dinihêrin. Germ û melûl.
Lê bi meraq.
«Sonata duwemîn bû...»
Çavên germ yanê deriyên bihuştê germiyekê bi ser
bedena Memduh Selîm Begê re wer dike. Ew nikare
xwe li ber nêrîna çavên germ ragire. Ew li dostê xwe
vedigere. «Mîrê min, xweziya min bi te, dengê keman-
çê ji mala we radibe.»
Piştî bfhnekê, ew dîsan dixwaze xwe bide ber beroş-
ka çavên germ. «Hûn bijîn, we xweş lêxist.»
13
Şûx û şengê zuhrerengê dil ji min bir, dil ji min
«
Awirê heybetpilingê dil ji min bir, dil ji min
Wê şepalê miskîxalê dêmdûrê gerdanşemalê
Cibheta bîskan sema lê dil ji min bir, dil ji min.»
Memduh Selîm Beg xwe spartiye şi'îran û ew şi'îra
36

Melayê Cizîrî «Dil Ji Min Bir» dixwîne. Wî deriyê dilê xwe ji aheng, xweşî û spehîtiya şi'îran re vekiriye. Ji kêfa dil re payan tune. Dil bi firê ketiye û ew li ser ewrên spî govend digire.
Gelo ew çirûskên evînê ne?
Memduh Selîm Beg şi'îr nanivîse, lê dixwîne. Ew xwendevanekî dilsoz yê şi'îran e. Li gor wî, dilê ku deriyê xwe ji şi'îr û germiya şi'îran re venake, dilekî nîvmirî ye. Dilekî weke çoleke zuha, erdekî qiraç, devere-kî bêbergeh û tahtekî hişk û zuha. Li gor wî dil û şi'îr; yekitiya herî xweş, yekitiya zanîn û hîsan.
Memduh Selîm Beg li bexçê Zfrahî rûniştiye û deriyê dilê xwe ji şi'îran re vekiriye. Li ser masa wî, li milekî Hafiz û Xeyam, li milekî jf Melayê Cizîrî.
Tiştekî pê qewimiye. Lê çi? Ev çend roj in ku kêf-xweşiyeke tenik, perde bi perde, bi ser wî re tê. Memduh Selîm Begê navsal niha xwe hîn xorttir hîs dike. Derd û keserên xerîbî û sirgûniyê hinek, bi tenê hinek, ji wî bi dûr ketine. Weke ku ew di nav xewnekê de ye. Ew li şi'îra Melayê Cizîrî dinihêre û dikene; «xwezî ev xewn weha dewam bike...»
14
Li bexçê Zîrahî.
Ew.
Ew, tevî çend jinên din, ji deriyê bexçê dixuye.
Çend jinên bedenfireh û gilover, di nav kincine reş û girtî de, li pey wan jî ew; Xezal.
Belê, Xezal. Ji îroj pê ve, navê wê Xezal e.

Roj li ber avabûnê ye. Tîrêjên wê yên neqehîm li ser giyayên parqê diçirûsin. Giya li ber hngên wê leylan dide. Li dor wê jinên qelaw, bi îhtimaleke mezin dê, met, xaltî, nas û cîran. Di nav pezkoviyan de xezaleke

37

nazdar. Xezal, hêdî hêdî, bi nazdarî dimeşe: kincine rengîn û guliyên dirêj ku heta ser hêtan tên. Eniyeke fireh. Bejneke dirêj. Tîrêjên sor yên rojê xwe digihînin wê. Tîrêj li enî, kezî û guliyan diçirûsin.

Xwedeyo!

Memduh Selîm Begê ku weke her carî, dana êvarê, li bexçê rûniştiye, wê dibîne. «Xwedeyo!» Best lê radibe.

Ew tên û çend mase ji Memduh Selîm Beg bi dûr, li dor maseyekê rûdinin. Pişta wê bi Memduh Selîm Begê ye. Stûyê dirêj weke sitûn, guliyên dirêj, pişta zirav û hêtên xweş û vekişiyayî.

Bejndirêjê, pordirêjê, bedenziravê!..

Çima? Ma wê Memduh Selîm Beg nedît ku weha pişta xwe dayê, rûyê xwe jê zivirand? Yan? Heye ku nazdarê naz dike. Heye ku tiştên ku Memduh Selîm Beg hîs dike, ew hîs nake. Yan jî heye ku Nazdarê hay ji xewna şêrîn ya Memduh Selîm Begê heye û dil dike bila xewn hîn bêtir bi heyecan be.

Rûyê pezkoviya mader yanê diya wê, ber bi Memduh Selîm Begê ye. Ew wî dibîne. Çav li hevûdu dinihêrin, rû dibişirin. Ew kitêba destê xwe, bi hêdîka, da-

tîne ser masê, nik kitêbên din, bi hêdîka radibe pê, xwe dide hev, qumçikên çakêtê xwe digire, qirawata stûyê xwe rast dike û ber bi wan dere.
«Iyi gunler, nasilsiniz? Mirim afiyetde mi?»
Yanê, rojbaş, hûn çawan in? Mîrê min di afiyetê de ye? Bi tirkî, bi hurmet. Bersîva dê û çend peyvên din. Bi tirkî. Hingê Xezalê serî ber bi jor dike û li jor, li Memduh Selîm Beg dinihêre. Stûyê vekişiyayî û çav û lêv û rû û kena li ser rû.
Binevşa Narîn, dastana Binevşa Narînê... Hingê ew dikeve bîra Memduh Selîm Begê. Ew nizane çima, lê
38

ew keça bedew ya dastanan dikeve bîrê. Xezalê û Binevşa Narîn... «Lawo, ev Binevşê qîzekê pir bedew e, bedewbûn ji kesî re nehfştiye. Wexta ko radibî ser sî û sê çîv dikevin bejna wê. Çavin reş li ser in mîna hibra ser qaxetê; eniya wê fireh e mînayê gokmeydanê heyvê, bêhna sî û sê dermanê etara ji neqeba sêng û berê wê tê...»
«Kek Memduh, hûn çawan in?»
Dengê nerm û zelal jê dipirse. Zarşêrînê!
Kek? Çima kek?
«Spas Ferîha, ez baş im.» Ne xwişkê, bi tenê Ferîha. «Tu çawan î, baş î?» Ne hûn, bi tenê tu. «Nabêna te û kemançê çawan e? Tu li kemançê dixînî?»
«Spas, ez jî baş im. Belê, lê dixim. Kek Memduh, hûn dizanin, meriv divê her gav, her roj lê xîne da ku

meriv bibe hoste. Kemançe tiştekî welê ye ku gava me-
riv her roj lê nexîne, meriv nikare nêzîkî li wê û den-
gên wê bike.»
Ken li rû. Lêvên şil vedibin, diranên spî dixuyin. Ça-
vên bi kil dikenin. Lê gep sor in. Şermok? Şermokî?
«Mutlaka te hay lê heye... Fransizekî heye, Claude
Debussy... min bi xêra sonatên wî ji kemançê hez kir.»
«Bele, bele, ez bi çend sonaten wî dizanim. Ne pir
xweş, lê dizanim. Kek Memduh, welê dixuye ku hûn
şarazayê musîk û kemançê ne.»
Bêdengiyeke bi ken. Dan û standina çavan. Keneke
weke kena zarokan li ser rûyê wê.
«Ma we nedixwest ku hûn li nik me rûnin?»
Dengê pezkoviya mader ne bi daxwaz e. Dengekî
sar. Lê digel vê hindê jî, eger Memduh Selîm Begê şerm
nekira, ew de li wê dere, li nik wan rûnişta. Lê nabe, ev
yeka ne li gor edetan e.
«Spas, jixwe ez dê rabûma û biçûma. Bimînin di
39

xweşiyê de. Gelek silavên min ji mîrê min re hene. Bi
xatirê we.»
Memduh Selîm Beg careke din li Xezalê dinihêre û ji
wan vediqete.
15
Rê h Memduh Selîm Beg vebû. Ziyaretên wî bûn
zêdetir. Bi kêmanî heftê rojekê, du roj ling ber bi mala
çerkezan derin. Xewn divê dewam bike, winda nebe.

Sebebên çûyina mala çerkezan pir in; serîlêdan, kitêbekê, xebereke nû, mizgîniyeke xweş, vexwarina çayekê, bîhntengî, şêwirîn, deynkirina tiştekî. Yanê hincetên çûyinê. Hincetên nêzîkîli Xezalê kirin...
Niha jî, Memduh Selîm Beg, dîsan, bi xebereke nû hatiye mala wan. Rejîma nû ya Tirkiyê qanûnên nû anîne pê û rejîma reş û çavsor hîn têkûztir û xurttir bûye.
«Mirim, rejîma nû, gav bi gav, xurttir dibe. Hem li welêt û hem jî li derveyî welêt. Dewletên Ewrûpê jî alîkariyê dikin.»
Têkûzbûna rejîma Tirkiyê mirina hêviyên Memduh Selîm Begê ye, rê h vegera wî girtin e. Ew ne merivê welatê xerîbiyê ye. Ew li welatê xerîbiyê mêvan e, bi tenê mêvan. Ew xwe weke mêvanekî dibîne û li hêviya roja vegerê ye.
Ew dipê. Bêsebr, bê cîh û war. Lê bi hêvî, bi baweriya siûda qenç.
«Memduh Beg, qet xem mexwe, ev rejfm dê hilbiweşe. Ew çi dike, bila bike, xelasbûna wê tune.»
«Xwezî...»
Xwarin, vexwarin, qise û gotin. Karên rojane jî di ser de. Şev? Gelo şevên dirêj û xedar yên welatê xerîbiyê dê çawan derbas bibin?..
40

Evîn û bihuşta evînê? Ew li kû ne, xwe li kû veşartine? Memduh Selîm Beg dê wan li kû bibfne?

Ew... Ew û diya wê. Ew jî tên û li dor masê rûdinin. Karên wan yên mitbaxê xelas bûne. Wan bîhnvedan divê. Diya wê li kêleka Memduh Selîm Begê, ewjîli kêleka bavê xwe rûdine.Ew û Memduh Selîm Beg, bi çeprastî, li hember hev in. Ew; stêrikeke ronî û li hember Memduh Selîm Begê rûniştî. Roniya çirê li ser rûyê wê diçirûse.

Keçikeke weha... evçend xweş û tendirust.

Piştî ku ew rûdinin, Memduh Selîm Beg û hevalê wî xebardana xwe didomînin. Gava bavê wê dipeyive, ew jî rû û serê xwe yê ronî ber bi aliyê bavê xwe xwar dike. Lê çav li ber wê, h masê dinihêrin. Gava Memduh Selîm Beg dipeyive, eniya wê hinekî ber bi jor dibe û çav li dest û tiliyên Memduh Selfm Beg yên bi pirç dinihêrin. Ew bêdeng rûdine û li gotinan guhdarî dike. Hebûna wê germiyekê dide odê û tiştên odê. Hebûna wê dilê Memduh Selîm Begê germ dike.

Çavên wan zêde bi hev nakevin. Ew li masê, Memduh Selîm Beg jî, zêdetir, li bav û diya wê dinihêre. Lê carina, gava ew gotinên hevalê xwe lê vedigerîne û jê pirsina dike, hingê ew li her siyan dinihêre. Hingê çav li hev dinihêrin, germ û xweş.

Lê belê, digel germî û xweşiyê, nêrîneke çawan?

Weke nêrîna keçikeke biçûk û mamê wê? Weke nêrîna xwişka biçûk û birayê mezin? Weke nêrîna du dostên dilsoz? Yan jî nêrîna du evîndaran?

Nêrîneke çawan?

16

«Pîroz be Memduh Beg, Xwedê şênahiyê ji mala te kêm neke.»
41

«Te biryareke pir baş da Memduh Beg, pîroz be. Biryara te di cîh de ye.»
«Spas.»
«Memduh Beg, hûn bijîn, bi xêr û xweşî be... Hevalno, em divê hem sersal û hem jî vê bûyera rind pîroz bikin. Qedehan ji bo Memduh Selîm Beg, ji bo salên çêtir, xweştir û serfiraztir hildin.»
Sersal. Sersala 1927 an. Antaqiye kêf dike. Heval û dostên Memduh Selîm Begê kêf dikin. Memduh Selîm Beg kêf dike. Ew ji halê xwe razî ye, ken ji rû kêm nabe.
Memduh Selîm Beg; por û simbêlên şehkirî, rîhê xweşkurkirî, kincên reş û nû, pêlavên reş û spehî, saeteke piyan ya zîvîn û spas, spas, spas. Spas ji Yezdanê mezin re, ji dinya û jiyana xweşik re, ji heval û dostan re, ji «Bavo», bavê Xezalê re,.. spas.
Belê, Memduh Selîm Beg îşev, şeva sersalê, destgirtî dibe. Qewl tê birîn. Gaveke nû ber bi heyameke nû tê avêtin. Bi kê re? Ma ew dikare bi kê re destgirtî bibe? Bê guman, bi Xezalê re. Bi gula nûbişkovî Ferîha re. Daxwaza dilê wî hat dewsê. Di welatê xerîbiyê de, wî ji dilê xwe re stariyekê peyda kir. Bi vî awayî, ew dê derd û keserên welatê xerîbiyê kêmtir bike, derd û kulên xwe derman bike. Ew dê bikaribe, di welatê xe-

rîbiyê de, -jî- serfiraz û kêfxweş bijî.
Hay lo gidiyo hay looo!..
Memduh Selîm Beg û heval, dost û nasên wî li mala bavê Ferîha'yê, h mala xwezûrê xwe yê pêşerojê rûniş-tine û sersala nû û nîşana Memduh Selîm Begê pîroz dikin. Maseyeke pir dirêj û li dor wê jîmerivên rûken. Bi tirkî û kurdî musîka welêt. Çend dengbêj û sazbend. Her texlît xwarin û vexwarin. Bê guman, araq jî. Tiştê kêm; di nav dengan de dengê kemança Xezalê.
42

Memduh Selîm Beg û hevalê wî yê çerkez li hember hev rûniştine. Hevalên kevn dê, di demeke kurt de, bi-bin zava û xwezûr.
Jin ne li nik wan in. Jin jî li maleke din rûniştine. Li gor edetan divê weha be.
Li nik Memduh Selîm Begê hevalekî wî yê kurd rû-dine. Hevalên kevn yên Stembolê bi hev re qesta felekê dikin û dipeyivin. Li ser her tiştî. Lê Ferîha û welat navenda xeberdanê ne.
«Memduh Beg, hûn jîr in. Li gor gotinan, destgirtiya we gelek xweşik e...»
«Mîrê min, hûn dizanin, tu pîvanên xweşiyê tune. Ew li gor kesan diguherin. Salixdana xweşiyê jîne ew-çend hêsan e. Piraniya caran ne di cîh de ye jî. Yanê meriv nikare xweşî û spehîtiyê bi qise û peyvan sahx bide... Ez çi bibêjim? Ez nizanim tê bîra we, li Stem-bolê jî, em h ser vê meselê gelek dipeyivîn. Hûn diza-

nin Homeros ji bo vê meselê mîsala herî baş e. Di de-
rekî de, ew ji bo sê jinan weha dibêje; Nireus xweşik
bû, Akhileus hîn xweşiktir bû, Helena xwedanxweşi-
kiyeke nedîtî bû... Mîrê min, hûn dibînin... kin û kurt;
xweşik, xweşiktir û xweşikiyeke nedîtî. Destgirtiya
min jî carina xweşik e, carina ji her carî xweşiktir e û
carina jî xwedanxweşikiyeke nedîtî ye. Kin û kurt, ew
rind e, mîrê min...»
Ken. «Noş mîrê min, ji bo serfiraziya me û welêt.»
Welat.
Welatê siûdxirab. Welatê bêkes, xirbe û kavil. Şewi-
tî. Nezan û bindest. Welatê perçekirî, jihevxistî. Hêstir,
xwîn, şîn. Sêdar û sehpayên li pey hev rêzkirî. Girtî-
xane û zîndan.
Welat.
Memduh Beg, me xebat divê. Welat li hêviya me û
43

xebata me ye. Piraniya bîrewer, ronakbîr û şerwanên
ku ji welêt reviyane, niha h Sûriyê û Lubnanê ne. Em
divê bicivin ser hev.»
Welat...
«Rast e, mîrê min, rast e. Me şermeke mezin e ku
em weha destgirêdayî li malên xwe rûdinin. Me xebat
divê.»
Sersala 1927 an. Kêf, henek û ken. Şênahiya sersalê.
Dawet û dîlana nîşanê. Xwarin û vexarin... û welat.
«Hevalno! Noş... ji bo selametî û serfiraziya Mem-

duh Selîm Begê.»
«Mîrên min, Noş... ji bo selametî û serfiraziya welêt...»
17
Destpêka bihara 1927 an. Dana êvarê. Parq. Memduh Selîm Beg, Ferîha, diya wê û du merivanên wê. Hûnikayiyeke sivik. Hawirdor hêşîn dibe. Tov zîl didin, kulîlk dibişkovin.
Gava Memduh Selîm Beg dixwaze destgirtiya xwe bibîne, keriya pezkoviyan jî pê re ye. Edet weha ye. Ew, Ferîha û keriya pezkoviyan, li gor edetan, li bexçê, di bin siya dareke henarê rûniştine. Jin û xanimok çay vedixwin, ew jî, weke her carî, qehwa tahl.
Kulîlkên rengîn yên dara qehîm dibişkovin. Mase tijî ne. Zarok di navbera masan de dibezin. Şênîbi coşa biharê, ji malên xwe derketine. Çavên Memduh Selîm Begê di navbera kulîlk û zarokan de derin û tên. Çav li nik pîrejinan şerm dikin li çavên xweşik û genimîbinihêrin. Jê re hênceteke divê ku lê binihêrin.
Ew radibe pê û ji dara henarê kulîlkeke nûbişkovî jêdike. «Kêfa min pir ji kulîlkên henaran re tê. Ev reng, rengê jînê ne.»
44

Ew niha li çavên genimî dinihêre. Çav ji kêfxweşiyê dibiriqin.
«Ez jî jê hez dikim. Bavo û Yadê jî. Ma ne welê ye, Yadê?»

Kulîlka rengîn ya Bavo û Yadê...
«Hûn darên henaran yên Wanê bibînin! Rebiyo, ew çi darên xweş in, ew çi kulîlkên spehî ne! Niha der û dorên Wanê bi rengên xweşik, ji nû ve vedijin. U tahma henarên Wanê... Libên mezin û gulover yên henaran di devê merivan de dibin şekir.»
Jin û xanimok serên xwe dihejînin.
«Bi xêr, gava em vegerin welêt, min dil heye ku xaniyekî li kêleka gola Wanê ava bikim. Hingê ez û Ferîha dikarin li wê derê bi cîh bibin. Hûn jî dikarin werin serîdana me. Ma ne wisan e, Ferîha?»
Rebenê. Çav carekê li Menduh Selîm Begê û carekê jî li pezkoviyan dinihêrin. «Eger Xwedê qismet bike...»
«Hingê me bexçeyekî hûr jî divê. Bexçeyekî xweşik. Em dikarin di bexçê de çend darên henaran jî biçinin.»
Wan, Gola Wanê, kêleka avê, xanî, Bexçe, jin, zar û zêç, xweşî, serfirazî, rindî... Memduh Selîm Beg li Antaqiyayê, li parqê rûniştiye û xewn dibîne. Ew, dîsan, xewn dibîne. Xewnên rojê, xewnên rojane. Xewnên ku li ser bextê dijmin, qismeta Xwedê û dilkirina Bavo û Dayê ava bûne.
45

DENGÊ DÎL Û DENGÊ MÊJÎ

1

Destpêka payiza 1927an. Beyrût, bihuşta Rojhelata Navîn. Meydana Bircê. Meydaneke fireh û dirêj. Di meydanê de parkekî gul û kulîlktijî. Memduh Selîm Beg li parqê rûniştiye û li hêviya hevalekî xwe yê kevn e. Eynî weke parqê Antaqiyayê, aveke biçûk di vî parqê re jî dibihure. Ava zelal hêdî hêdî diherike. Çavên Memduh Selîm Begê li kuçeyên meydanê ne. Li meydanê kuçene fireh dixuyin. Girsa merivan li hev gêr dibin, derin û tên. Evçend meriv! Her celeb, her texlît. Ev meriv çi dikin, çi difikirin, bi çi karî mijûl in? Ew çi dibin bila bibin, lê belê, ma ev hemû ne wekhev in? Ma ew nizanin ka evîn û hezkirin çi ye? Ma ew nizanin ka rebenî, belengazî, xemgînî, dilsojî çi ye? Belê, ew dizanin. Her meriv bi van yekan dizane. Meriv hosteyê hîsan in. Hîs û nefs ji bo merivan in. Hingê?.. Hingê meriv wekhev in. Digel her celeb dijîtî û ferqî, ew wekhev in. Hingê meriv divê li pey biratî û merivahiyê bin. Meriv li kû dibin, bila bibin, çi dikin bila bikin, çi difikirin bila bifikirin, lê eynî tiştî dibihîsin, eynî tiştî hîs dikin û dijîn. Hingê çima ev hilweşandin, jihevûduveqetandin, zulim û xeniqandin?
49

Hevalê Memduh Selîm Begê dê ji kuçeyekê bixuye. Hevaltiya, dostiya kevn. Ew rojên Stembolê. Xebat, best, daxwazî. Hêviya Kurdistaneke xweser û yekgirtî. Dan û standinên dîplomatîk; îngihz, fransiz, îtalî, ermen û yewnan. Salên piştî şerê cîhanê. Salên 1916-17-

18-19 û 20an... Hevaltiyeke pak, dilovan û dilsoz. Meyxanên Galata û Beyogluyê. Jinên spehî, dîlberên rûm, îtalî, rûsên spî, ermen û fransiz. Zimanên têkel û cûrbecûr. Jiyaneke rengîn û heyecantijî. Robara Salên 1918 û 1919 ku kovara «Jîn» diweşiya. Salên ku Memduh Selfm Beg berpirsiyar û nivfskarê kovarê bû. Civînên kovarê. Babetên ku li ser dihatin peyivîn; ziman, yekitiya kurdan, yekitiya jinan, medeniyet û kurd, klasîkên kurdî, Ehmedê Xanî, şerê cîhanê, perçebûna dewleta Osmanî, biratî û yekitiya urdan, yekitî, yekitî, yekitî... Memduh Selîm Beg û hevalên wî. Ew û hevalê wî.

«Memduh Beg, birayo, tu berpirsiyarê kovarê yî. Hûn divê ji bo alfabeya nû bixebitin. Me û zimanê me herfên latînî divên. Alfabeya erebîû herfên erebîne li gor zimanê me ye. Sibê roj, dema dewleta me ava bibe, em divê herfên latînî bi kar bînin... Ma ne wilo ye, birayo?»

«Belê, mîrê min, belê...»

Ji 1922an vir ve ye ku Memduh Selîm Beg hevalê xwe nedîtiye. Ew şeva çiksayî hê jî tê bîra Memduh Selîm Beg. Kadikoy, Stembol. Her du bira dê bi hev re biçûna Alemanyayê, Munîxê... 1922 û niha jî 1927. 5 sal in ku wî hevalê xwe nedîtiye. Ew jî, weke Memduh Selîm Beg, tevî bav û birayên xwe, di welatê xerîbiyê de, şerpeze û aware bûn. Siûd li wî jî qulipî. Bavê wî par li Misirê çû rehmetê. «Rehma Xwedê lê be.» Birayê wî Safter li Alamanyayê li ber mirinê ye. «Heyf, hezar

heyf.» Bapîrê wî, mîrê mîrîtiya kevn ya Cizre-Botanê Mîr Bedirxan li welatê xerîbiyê, li Şamê wefat kir. Ew û birayên wî Sureya û Kamuran niha li Beyrûtê ne.
«Ez hêvî dikim ku siûda wan nabe weke siûda bav û kalikê wî...»
Xelk, weke ava ber Memduh Selîm Begê, li meydanê diherikin. Gava Memduh Selîm Beg dil dike ku li saeta xwe binihêre, di devê koşeyekê de, hevalê wî dixuye. Ew Memduh Selîm Beg nabîne, li dora xwe dinihêre. Eynî weke xwe, rûyê esmer, eniya fireh, çavên reş, bejna dirêj, asalet û dilovaniya li ser rû. Eynî weke berê.
«Mîrê min, Celadet Beg, mîrê min!..»
«Memduh Beg, birayo, hevalo!..»
Hevûdudîtina wan dibe weke hevûdudîtina axa zuha û baranê. Dest û rû radigihên hevûdu, ew hevûdu hembêz dikin, radimûsin. «Birayo Memduh Beg», «mîrê min», «hevalo Memduh Beg», «mîrê min.»
«Memduh Beg, welê dixuye welatê xerîbiyê li te hatiye, tu baş dixuyî.»
«Ji kû mîrê min, ji kû... ma te li tu derî dîtiye ku welatê xerîbiyê li merivan hatiye?»
2
Eynî şev. Meyxaneke Beyrûtê. Dengê musîkê. Reqasên spehî. Dil û mêjî germ dibin. Qedehên araqê bi hesreta çend salan radibin. 5 sal û berhemên wan; derd,

kul, qahr û keser. «Birayê Memduh Beg, ma te hay lê hebû ku em dê, rojekê, di deverên xerîb de, weha neçar û bêgav bimana?»
Memduh Selîm Beg li hevalê xwe dinihêre û dikene. Wî mînet e ku ew xwediyê hevalekî weha ye. Meriv di-
51

kare bi hevalên weha re her tiştî bike, pê re here her derî, jê re her tiştî bibêje. «Mîrê min, Celadet Beg, dilê min bi firê ketiye.»
«Gidiyo birayo! Min hay ji bûyerên dawîn nîne, he-le bibêje ka çi bi te qewimiye?»
«Mîrê min, ez çi bibêjim? Wisan dixuye ku ez bi ta-ya evînê ketime.»
«Birayo tu çi dibêjî! Kî ye, çi kes e, li kû ye?»
Ken, kêfxweşî, pirs, bersîv, salixdan, henek û xe-berdaneke dirêj, nerm û germ.
«Xweziya min bi te, birayo. Xwezî dilê min jî weha bi firê biketa.»
Di bin siya araqa spî de xeberdan hîn dirêjtir dibe; hal û hewal, heval, bira, dost. Bav û bapîr. Welat û nîş-timan. Ewrûpa, Alamanya, bûyerên wê derê. Babilîska lez û bezê. Bişûndamayina xelkê kurd û welatê Kurdis-tanê. Baş e, çi divê?
Çi divê?
«Mîrê min, ka te simbêl û rî çi kirin?»
«Min ew kur kirin. Lê ew dê dîsan serî hildin. Ji nû ve... bi awakî hîn xweştir û geştir. Birayo, em dê dest

bi xebatê bikin. Xebateke xurt, nûjen û bi rêk û pêk. Her tişt divê nû be, her tişt divê modern be. Her tişt birayo, her tişt. Herweha simbêl û rîh jî. Me wekî din çare tune...»

3

Dotira rojê. Memduh Selîm Beg, Celadet Alî Bedir-xan û gelek kesên din, li Beyrûtê, li hev civiyane. Hinek ji welêt, hinek ji Ewrûpayê, hinek ji Iraq û Misirê û Memduh Selîm Beg jî ji Antaqiyayê hatine. Pêşewayên kurdan. Merivên şerpeze, peregende, dilbirîn û keser-kûr. Lê pêtên best, daxwazî û hêviyê li dor wan diçirû-

52

sm.

«Xebat divê.»

«Serîhildan divê.»

«Yekitiya kurdan divê.»

Divê, divê, divê... her tiştê pêwist, her tiştê xweş, her tiştê ku kêm e, divê.

«Dewleta Tirkiyê welatê me hildiweşîne, dike kavil, xirbe û çol. Wan zimanê me jî qedexe kiriye. Wan bi hezaran meriv kuştin... weha nabe.»

«Xelk û welat li hêviya me, li hêviya ronakbîr û pê-şewayên xwe ne.»

«Em nikarin gelê xwe bi tenê bihêlin.»

«Me xebateke bi rêk û pêk û yekgirtî divê.»

«Berî her tiştî jî em divê bersîva vê pirsiyarê bidin; çima xebat?»

Sebebên xebatê; bûyerên welêt, siyaseta dewleta Tirkiyê, perçebûna welêt, serîhildana 1925 an, şikestin, qetlîam, bêdengî, mij û dûmana ku ji welêt radibe, malên hilweşiyayî, jinên bpekes û xemgir, zarokên tahzî û stûxwar, zarokên ku digirîn, zarokên sêwî, zarokên...

Yanê dastana dîlketinê. Trajediya welatekî jihevketî.

4

Civîn didomin. Iroj jî roja biryaran e. Ew yanê Memduh Selîm Beg dipirse; «baş e, mîrên min, em dest bi xebatê bikin... Em dikarin ji hal û hewalê welêt dest pê bikin. Hal û hewalê me li welêt çi ye? Xelk bi me re ye? Çend hêzên çekdar hene, ew li kû ne, em dê xwe çawan bigihînin wan?»

Xeberdaneke dirêj, geş û bi saetan. Lihev û jihevpirsîn. Lêhûrbûn. Li ser kaxizan nivisîn.

53

«Baş e, rewşa Ewrûpayê çi ye? Halê kurdan li wê derê çi ye? Kf dikarin bi me re bixebitin? Kîjan dewlet dikarin alîkarî û piştgirtî li me bikin?»

Dîsan xeberdaneke dirêj, bi saetan. Pirs û gotinên piralî û li ser kaxizan nivisîn.

«Li Kurdistana Iraq û Iranê rewş çi ye? Bê guman, me li wan deran jî xebat divê. Em dikarin bi kîjan hêzan re bixebitin? Kî dikarin li wan deran bibin niwênerên me? Kîjan heval dikarin herin wan deran?»

Dîsan xeberdaneke dirêj, bi saetan. Pirs û gotin. Lê-
hûrbûn û li ser kaxizan nivisîn.
«Em divê rêkxistineke nûjen û bi rêk û pêk ava bi-
kin. Me dan û standinên fireh divên. Me îmkanên me-
zin divên. Dan û standin bi cîranên me re, yanê bi er-
men û ereb, fars û tirkên li dijf dewletê re jî pêwist in.
Em van dan û standinan bi çi awayî ava bikin?»
Dîsan xeberdaneke dirêj û boş. Lihevpirsîn. Lêhûr-
bûn. Nivisîn. Kêfxweşî û heyecana dest bi xebatê kiri-
nê. Xwîdana xebateke 14-15 saetan, dilopên hêviyê û
pîrozbahiyê.
«Ji îro pê ve, di jîna gelê me de heyameke nû dest
pê dike. Bila yekitiya me, partiya me ji gelê me re, ji
welatê me re pîroz be!»
Bijî, spas, bi hêviya biserketin û serfiraziyê.
«Bila navê partiya me XOYBUN be. Yanê heyin,
yanê hebûn. Yanê hebûna gelê me, hebûna welatê me,
hebûna jîna gelê me, hebûna hêviyê...»
Memduh Selîm Beg di nav koma merivên rûken de
xwe bextiyar hîs dike. Gava yekemîn hat avêtin. Xwe-
dê ji yên din re kerîm e. Ew ji kêfxweşiyê, ji awayê wê
derê kelgirî ye. Hevalên wî jî. Ew hevûdu hembêz di-
kin, daxwaziya serfiraziyê li hev dikin.
Ew dikenin. Keneke ji dil, keneke bêhempa.
54

«Bila Memduh Beg û Celadet Beg, bi hev re, bi fran-
sizî, îngilizî, elmanî, tirkî, erebî û kurdî danezaneke

resmî binivîsînin da ku em ji dinyê re nîşan bidin ku kurd namirin.»
Belê, kurdên nemir û Memduh Selîm Beg...
«Her bijî...»
5
Li otêlekî Beyrûdê. Odeyeke fireh û xweşraxistî. Du nivîn, çend kursiyên spehî, maseyeke fireh û textîn, li erdê xalîçeyeke stûr û rengîn, li ser dîwaran çend neynik, lewhe û tablo. Li ser masê, li ser nivînan û li erdê kitêb, kovar û rojnameyên têkel. Li ser masê xwelîdankeke tijî û cixare.
Bi odê ve balkoneke fireh. Li pêşiya otêle derya bêdawî. Derya û aso bi rengekî şîn dibiriqin. Roj hê hilnehatiye. Berbang. Li dûr, li ser deryayê çend keştî weke niqtikên hûr û reş dixuyin. Li rexên avê jî pêlên spî yên deryayê. Di balkonê de jî maseyeke dirêj û di her du kêlekên wê de du kursî û li ser kursiyan jî du ronakbîrên dilsoz; Memduh Selîm Beg û Celadet Alî Bedirxan Begê Botî. Li ser masê qedehên araqê, fîncanên qahwê, tomarên kaxizan, xwelîdankên tijî û kitêb, kovar, rojname.
Xew hê neketiye çavên wan. Ji êvar de ye ku ew rûniştine û li ser belavokan dixebitin. Belavok ji bo dinyê û Ewrûpayê, belavok ji bo Rojhelata Navînê, belavok ji bo dewletên tacîrker û nemaze Tirkiyê, belavok, ji bo gelên cîran û belavok ji bo gelê kurd.
«Kurdên ezîz, ji bîr mekin ku hûn jî ferdên milettê kurd in û berpirsiyariyên we yên tarîxî hene. Eger em,

hûn berpirsiyariyên xwe bi cîh neyinin, hingê em, hûn dibin kesên xirab û gunehkar. Çar hezar sal in ku mille-
55

tê kurd li ser erdê xwe, li welatê xwe dijî. Lê îro, di vê gava tarî û reş ya tarîxê de erdê milletê me, welatê wî hatiye perçekirin, wêrankirin. Welatê me îro di nav şî-nê de ye. U hukumeta Tirk ya xaîn êrîşên xwe yên hov roj bo roj zêdetir dike. Wan dil heye ku welatê kurdan bikin tirk...
Di vê rewşa ha de we çi divê? Xwe ragirin, kirasê la-qaytî û bêdengîyê ji xwe bikin, çekên xwe hildin...»
Memduh Selîm Beg, penûs di dest de, li belavokan dinihêre û dikene. Carina ew li ser peyvine radiweste, wan xêz dike û li kêlekê peyvine nû, çêtir dinivîse. Pe-nûsa yadfgar di nav pêçiyên wî de weke bûkekê dixu-ye. Pêçiyên dirêj, qelaw û bi pirç penûsê dilivînin. Pe-nûs, bi awakî pir sivik, dilive û li ser kaxizên spî tîp, peyv û hevokan tîne pê. Penûs ewçend bi hêsanî û re-hetî fikrên Memduh Selîm Begê li ser kaxizan direşîne ku meriv bawer dike, tilî û pêçî ji bo pêgirtina penûsan hatine afirandin. Bi tenê ji bo pêgirtina penûsan...
Memduh Selîm Beg, yek bi yek, li belavokan dinihê-re, tiştine li kêlekê dinivîse û wan, yek bi yek, dide Ce-ladet Bedirxan Begê... û dikene.
«Mîrê min, belavokên me baş lêhatiyî ne.»
Hevalê wî jî serê xwe dihejîne û dikene.
Belê, li balkona oteleke Beyrûdê, h ser derya zelal,

bedenên westiyayî. Çavên sorbûyî, binçavên werimî. Porên tevlihev, rîhên nekurkirî. Lê digel vê yekê, tevî herçendî ken. Ken û heyecana xwe bikêrhatî hîskirinê. Ken û heyecana gaveke nû, xebata welêt û gel. Ken û heyecana ruhên geş û mesûd.
Ax! Ev ken û heyecan her bidomiya, her bêdawîn bûya! Ew perde bi perde firehtir bûya, dil û ruhê her kesî dîl bigirta û guherînên xweş bianiya pê!
«Mîrê min, em pir westiyan. Ma em bedenên xwe
56

yên westiyayî, hinekî, bernedin nav xewên şêrîn?»
«Belê birayo, em berdinê. Lê pêşî em cixareyeke din jî bikişînin.»
Tiliyên zerbûyî radihên cixaran. Çend nefesên kûr. Dûman. Dinya germ û ava zelal. Dengê pêlên deryayê. Dengê erebe û faytonên Beyrûdê. Dengê bajarê nûhiş-yarbûyî. Hevalên kevn, hogirên gava nû, cixare di des-tan de, bêdeng, li dûr, h deryayê dinihêrin. Di serên wan de bi sedan fikir, guman û pirsiyar. Di dilên wan de hêvî. Hem yekîtî û hem jî dijftiya dil. Fikir, pirsiyar û hêviyên şexsî, neteweyî û merivahiyê.
Cixare û dûman.
«Mîrê min, min dil heye ku em hinekî bêtir li ser be-lavoka ji bo dinyê û Ewrûpê bixebitin. Ew wê çêtir bi-kin.»
«Rast e, birayo. Ez jî pê ne qaîl im. Cimleyên me di-rêj û tevlihev in, ew baş li hevûdu nehatine girêdan û

baş fahm nabin. Peyvên ku me nivisîne, ne bi dilê min in. Ew baş nehatine helbijartin û hinekî jî hişk û tûj in.»

«Belê, min jî ev tirs heye. Ne hewce ye ku em qiseyên tûj, qelaw û sert yên siyasî helbijêrin. Em siyasetê ji ewrûpayiyan hîn bûn. Ji ressamekî yekta re behsa lihevhatina rengan kirin abes e. Çêtir e, meriv behsa germiya rengan bike, behsa ew rengên taybetî yên welêt bike. Mîrê min, em divê bang li wîjdanê wan bikin. Herçend derd û belayên ku tên serê me, ji rûyên wan bin jî, me li wîjdanê wan xîtapkirin divê...»

Wîjdan... Memduh Selîm Beg behsa wîjdanê dike, lê ew bi xwe jî bi qisê xwe ne bawer e.

Wîjdan; peyveke germik û nermik. Peyveke zêrîn, qedirgiran. Peyveke ku her kes, bê qeyd û şert her kes, rêz û rêdarî lê dike. Lê ew li kû ye? Li cîhanekê ku

57

dengê tanq, top, pere û neftê hawirdor vegire, cfhan bibe seyrangeha musîbetan, jiyan ji bo merivan bibe kemîneke xedar û malkambax, hingê dengê wîjdanê li kû dimîne? Li cîhanekê ku durûtî, sextekarî, tawan û tawanbarî bibin tiştine hêja û giranbuha û li milê din jî biratî, alîkarî û merivahî di goristanên kavil û bêdeng de şîna reş girêbidin, hingê meriv dikare li kû wîjdana sihêrîn peyda bike?..

Wfjdan; kurte-çîrokeke xweşik, lê di nav rûpelên zer yên kitêbeke kevnar de jibîrbûyî. Wîjdan; sonateke

nermik û melûl, lê li ser piyanoyeke bi torên pîrhevo-
kan rapêçayî û sonata musîknasekî kal, tenê ûjibîrbû-
yî. Wîjdan; bîranîneke nezelal ji rojên rabirdû, mûyekî
şikestî ji firça wênekêşekî dîn...
«Birayo Memduh Beg, min qebûl e, em bang li wîj-
danê ewrûpayiyan bikin, lê tu divê hay lê hebî, îro kes
ne li pey wîjdanê ye. Cîh li merivan teng bûye, wext
kin û kurttir bûye. Her kes h pey menfeeta xwe ye.
Roj roja hevûduxwarin û çavderxistinê ye. Masiyê stûr
yê hûr dixwe û ev yeka jî weke qaîdeyekî normal tê
zanîn. Tu dizanî, berî niha bi demekê ez li Elamanyayê
bûm. Te dê ew der bidîta! Te dê bidîta elaman bi çi a-
wayî hevûdu dixwin. Elamanya pir bi lez ber bi cîhine
tarî gêr dibe. Ew di şerê masiyan de, ji xwe re, li cîhekî
digere. Belê, şerê cîhanê xelas bû, lê şerê masiyan her
berdewam e û ew hîn xurttir dibe. Birayo, me ev yeka
hanê divê; em nebin masiyê biçûk. Nebin nêçîr.»
Hey gidî dinyayê hey! Hey gidî dinya nêçîr û nêçîr-
vanan hey!
Hey gidî dinya masiyên stûr hey!
6
Belavok hatin nivisîn, lê ji Partiyê re hîn gelek karên
58

esasî divên. Berî her tiştî bernamе û destûrek, dan û
standinên siyasî û xebatên rêkxistinî divên. Heta ev
tişt hinekî xwerû nebin, dev ji Beyrûdê berdan nabe.
Dil û mêjiyê Memduh Selîm Begê her roj, her saet bi fi-

rê dikevin, ber bi jor, ber bi tixûb dibin, derin maleke çerkezî û li wê derê, li ser milên keçikeke pordirêj ve-dinişin.
Dil û mêjî bûne weke kevokên evînê; ew dixwînin, difirin, hal û hewal dipirsin, radimûsin, hez dikin. Dil û mêjî, kevokên evînê, cîh û wext nenasin. Gava best li wan radibe, hesret nefes li wan diçikîne, ew dest bi xwendinê, dest bi firê dikin.
Niha jî dîsan, wisan e. Kevokên evînê dixwînin û ew bi firê ketine. Memduh Selîm Beg û hevalên wî rûniş-tine û li ser bûyerên dawîn û hêzên li welêt dipeyivin. Ew dê, li gor biryarên civînê, meriv bişînin welêt.
Zimanê kevokên evînê û ew zimanê ku ew pê dipe-yivin, ne wekhev in. Ew ji hevûdu pir bi dûr in. Yek li ser dengên beden û ruh, yê din li ser prensîb û qaîde-yên siyasî û eskerî ava bûne.
Yekitiya zimanan divê. Lê çawan?
Piştî têkçûna serîhildana 1925 an, hêzên çekdar yên kurd ji hev ketin, belav bûn. Ew niha, bela wela, bê serî û serokatî li dijî dewleta tirk şer dikin. Ew li her ahyê welêt hene. Eger ew bicivin ser hev, hêzeke mezin dê were pê. «Di bin serokatiya Partiyê de yekitiya van hêzan divê.» Ji bo hêzbûyin, ji bo şoreşeke fireh, gelêrî û nûjen ev pêwist e. Ev yekitî gava yekemîn e. Lê ça-wan?
«Memduh Beg, çawan?»
«Mîrên min, yekitiya zimanan... li min biborin... ye-kitiya hêzan bi du awayî dikare ava bibe...»

dikeve, şerm dike. Kevokên neb'xêr divê, di rojên weha de, bihewin, ber bi cîhine nelivin û wî eciz nekin.
«Me esker, zabît û kumandar divên. Eger em dixwazin, bi rastî, li dijî dewletê şer bikin, hingê kesên ku hoste ne, şareza ne û bi hewalê şer dizanin, divê serokatî bikin. Ez nikarim vî karî bikim. Axa û serokeşîr jî nikarin bi vî karî rabin...»
Rûyên esmer û cîddî. Ken û henek çûne welatê efsane û çîrokan. Ji yekî, Celadet Alf Bedirxan pê ve, hemû bi simbêl. Simbêlên cihê, lê qedereke wekhev. Eniyên fireh û qermûçektijî. Li pey wan mirin û sêdar, li pêş wan mij û dûman. Ba û bahoza babilîska 20 an. Ba û bahoza jiyaneke zincîrkirî. Ba û bahoza navsaliyê. Ba û bahoza xwedanmesûliyetiyê. Derd û kulên welatê xerîbiyê. Yanê babilîska lez û bezê û ev desteke meriv. Merivên bargiran.
Hevalên Memduh Selîm Begê hay li rewşê heye. Ew dizanin ku berpirsiyariya qedera milletekî binpê ketiye ser milê wan. Pir kes ji hevalên wan hatin kuştin. Ew jî di bin siya şûrê Ruhistîn re bihurîn.
Belê, şûrê Ruhistîn. Şûrê Ruhistîn li ser milê wan û milletê wan hilawistiye.
Ew şûrê Ruhistîn e ku rê li pêşveçûna tarîxa wan girtiye. Ew şûrê Ruhistîn e ku tarîxeke nû, tarîxeke derewîn aniye pê û h ser wan ferz kiriye.

«Rê divê lê were girtin. Ev gava me, ev gava ku em niha davêjin, divê tarîtiya ku dijmin li tarîxa me vegirtiye, biqelişîne û ronahî bireşîne ser tarîxê.»
Ji bo «reşandina tarîxê» jî piralîbûn. Ji her îmkanî, ji her fersendî destkewtîbûn. Di her warî de, li ser her babetî xebatkirin. Belê, şer bi qaîdeyên şer tê qezenckirin. Her çekê ku dikare tesîr li şer bike, divê bi kar were.
60

7
Beyrûd. Navenda çand û zimanên têkel. Pira navbera rojhelat û rojavayê. Gelên têkel. Ol û baweriyên têkel. Yanê dewlemendiya dil. Bêsînorbûna daristana rengîn ya fantaziyê. Comerdî û nefsbiçûkiya meriv. Keskesoreke rengîn di Rojhelata Navîn de, -di şergehê lîstik, plan, dek û dolaban de. Eger Memduh Selîm Beg li Beyrûdê bi dengê dil bihesiya, yanê hesretê lê bîhn neçikanda, ew dê li vê derê cîwar bibûya. Lê, ew niha mfvan e. Ew bi armanc û daxwazine giranbuha hatiye vê derê.
Rojên Beyrûdê jî, wekf Beyrûdê, ji bo Memduh Selîm Begê rengîn in; kar û xebat, erkên ji her tiştî girîngtir, ji her tiştî muqedestir. Şevên bêxew, carina ji bo xebatê, carina ji bo qesta felekê. Dengê kemançe û keçên xama yên yewnanî. Dîtina heval û dostan. Name ji bo derina. Dîtina karbidestên Lubnanê, fransizan.
«Monsieur Memduh Selîm, vous ne voulez pas un

peu de pernod?»
«Oui, merciez Monsieur... Ez ji bo serîlêdana heval û dostan û kêfê hatime Beyrûdê. Ne ji bo tiştekî din. Hûn dizanin, hemû rêgehên Rojhelata Navîn ji Beyrûdê derbas dibin. Dil li vê derê geş dibin.»
Ew li nik karbidestan e. Karbidest dixwazin bizanibin çima ew li Beyrûdê ye.
Lê di dilê geş de hesret. Hesret nefes lê diçikîne. Hesret kevokên evînê bi firê dixîne.
Xezalê.
Rûyê xweşik û bi ken. Rengê germ û zêrîn yê por. Porê dirêj. Yekitiya por û tîrêjên tavê. Çirûsk û şewq. Çavên masûm û kentijî. «Eger tu rastî min nehatibûyayî, min dê çawan xwe h hember evçend mûsîbet û belayan rabigirta?..
61

Li ser dilekf navsal û şewitf çirûskên evînê.
Bi dilekf geş û bi seriyekî germ û xweş, di şevên ronî yên Beyrûdê de rêveçûn. Bihust bi bihust Beyrûdê, sir û esrarên wê keşfkirin. Bi heval û dostan re qesta felekê kirin. Bê guman; araq, cacix, meze û dengên xweş. Bê guman; dengê kemançê.
Traaay laaa laaaay trayyyy...
8
Di şeveke ronî ya Beyrûdê de gazînoyeke mezin. Şev bûye nîvê şevê. Reqaseyên ereb bedenên xwe yên zarîf ba didin. Ji reqaseyan bi dûr, maseyeke fireh û li dor

masê Memduh Selîm Beg, Celadet Bedirxan Beg û çend hevalên din. Serê masê tijî ye. Hejmara şûşeyên vala pir bûye. Şevên weha ji bo wan bûye stariyekê. Gava ew diwestin, nefes li wan tê birîn, barê zimanê eskerî pir giran dibe, ew xwe dispêrin şevên weha da ku nefeseke kûr bigirin.
Celader Bedirxan Beg li ser Alemanyayê dipeyive; welatê endustriyê, welatê pole, karxane û fabrîkên bêhejmar, musîka klasîk, opera, merivên xwedandîsîplîn, jinên wekî hespan, aloziya aborî, «dolarekî amerîkî, belê, bi tenê dolarekî bi sedhezaran marq e...» û şerê Sosyal Demokrat, Komunîst û Nasyonal Sosyalîstan.
«Min tirs heye ku welatê Geothe û Beethovenê bin av be.»
Maseyên doralî tijî ne. Ereb, bi kirasên xwe yên spî û dirêj. Fransiz, bi kincên xwe yên eskerî. Jinên fransewî yên zirav û narîn.
U di nav maseyan de jinepîrekê. Jinepîrekê bi elbikeke gultijî. Jinepîreke gulfiroş. Hevalekî Memduh Selîm Begê, ji masê, bang h jinikê dike. Jinik, bi kêfxweşî, tê û elbika xwe datîne ser masê da ku ew gul helbi-
62

jêrin. Hevalê ku bang li jinikê kiribû, guleke stûr û nûbişkovî heldibijêre û bi ken wê dide Memduh Selîm Begê.
Heval hemû dikenin. Memduh Selîm Beg jî dikene.
«Mîrê min, gelek spas, lê çima, bi çi hêncetê?»

«Memduh Beg, ji dilê ku bi firê ketiye re, gul divê.
Ew dilê bextiyar her li pey gulan e.»
Ken. Careke din pîrozbahî. Dîsan kevok. Dîsan firî-
na kevokên neb'xêr. Xezalê. Heval û dost. Guloka kêf-
xweşiyê di gewrî de. Gewrî û zimanê zuha. Qedeh.
«Noş ji bo serfiraziya me û welatê me.» Kefçikeye ca-
cix. Qedeh. «Noş ji bo Memduh Begê.»
«Memduh Beg, te qet behsa destgirtiya xwe nekir...»
«Ez çi bibêjim, mîrên min? Gava we wê dît, jixwe
hûn dê bi xwe bibêjin ka ew însanekî çawan e.»
Memduh Selîm Beg ji bikaranîna qiseyên zêde û xwe-
şik hez nake. Ew wan û bi wan difikire, lê wan di xe-
berdanên xwe de bi kar nayine. Niha, dîsan xortiya wî
û ew kitêba şiîran tê bîrê. Hingê wî kitêbeke biçûk ya
şiîran xwendibû. «Navê wê kitêbê çi bû?..» Di kitêbê
de salixdan û pesndana keçikeke weke melayikan he-
bû; ji serîheta dawî qise û gotinên xweş, cimleyên zêr-
hêlî, peyvên neqişandî. Lê vala û bêruh. Lê bêdeng û
pejn. Yanê qise û gotinên zêde ku xweşî û spehîtiyê
têk dide.
«Ew jina herî xweşik bû... ew bexçê zerafetê bû...La-
tîf, narîn, hurme, bedew...» û qise û gotinên weha.
Wî di jiyana xwe de qiseyên evçend xweş, lê di eynî
wext de salixdanên evçend tewş nedîtibû. Hinekî ma-
bû ku wî ji xweşiyên jiyanê rû bada. Ji wê rojê û vir ve
ye ku ew di salixdana xweşiyan de bi dîqet e. Ew kêm
dipeyive, lê ne zêde.
«Mîrên min, rojekê ber bi min werin, hingê hûn dê

destgirtiya min jî bibînin. Ew xweşik e, mîrên min, xweşik. Ez, bi tenê, evçend dibêjim; xweşik. Her tişt di tahma xwe de xweş e. Meriv divê tahmê lê heram ne-ke.»

9

Teq, teq, teq.

Dengê derî. Dengê deriyê oda otêlê ya Memduh û Celadet Began. Dana êvarê. Ro li ser deryayê, di niqta yekbûna aso û avê de bûye weke agireke gulover. Ro, bêdeng, diçe ava. Beyrûd di nav haziriya şevê de ye. Dostên dilsoz, bi hev re, li balkonê rûniştine û li ser raporekê dixebitin. Raporeke li ser rewşa kurdan û neheqiyên ku li wan dibin. Ji bo Koma Milletan.

Ew li hevûdu dinihêrin. «Gelo kî ye?»

«Kî ye?»

Wan bihîstiye ku dewleta Tirkiyê mêrkuj û sêxur xistine pey wan. Ew dîsan li hev dinihêrin. Ew ji balkona odê, bi hêdîka, tên nava odê. Dest derin bin bahlîfan. Debançeyên reş û stûr. Gule di dêv de ne. Ew bi hev re, ber bi derî derin. Giran , giran. Tilî li ser tetikan in.

Teq, teq, teq...

«Birano! Em in, em in...»

Dengên nas. Keneke li ser rûyê Memduh û Celadet began.

«Fermo, werin hundir.»

Rûyên nas. Hevalên hebûn û nebûnê. Hevalên rojên

qeda û belayê. Di destên wan de pakêtine mezin. Germiyeke boş. Rehetiyeke ji dil. «De fermo, kursî bikişînin û werin em li balkonê rûnin. Hûn rûnin, ez herim ji me re qahwe bibêjim.» Memduh Selîm Beg dibezîne jêr, îdarexana otêlê.
Gava ew vedigere odê, heval hê jî li odê, li pê ne. Ew
64

li Memduh Selîm Begê dinihêrin û dikenin. Çi bûye çi qewimiye? Hewayê odê nîşan dide ku tiştekîheye. Lê çi? Niha Celadet Bedirxan Beg jî dibişire.
«Qey we dil heye ku ez ji meraqan dfn bibim! De bibêjin ka mesele çi ye!»
Pakêt. Pakêtên li ser masê. «Fermo Memduh Beg, wan veke.» Pakêta herî mezin. Li ser navine fransizî. Paris. Ew ji Fransayê hatiye. Vekirina pakêtê. Tê de kinc. Reş û xêzkirî. Çakêt, pantolon û êleg. «Pakêta din jî veke.» Li ser vê pakêtê jî eynî nav. Du gomlegên spî û çar qirawatên hewreşîmî. Ew dibiriqin. Memduh Selîm Beg dê niha çi bibêje? Tu tişt. Bi tenê ew li hevalên xwe dinihêre. Bêdeng. «Memduh Beg, pakêta dawîn jî veke.» Pakêteke hûrtir. Li serê eynî navên fransizî. Tê de coteke pêlav. Coteke pêlavên çermîn ûreş. Pêlav dibiriqin.
«Hevalno, ax hevalno...»
Memduh Selîm Beg şa ye. Ew wekî zarokekî şa û mesûd e. Rû û hinarikên wî sor bûne. Ew xwe radigihîne hevalan û wan yek bi yek hembêz dike. «Hûn çi

hevalên qedirgiran in!..» Ew vî tiştî nabêje, lê lê difiki-
re.
Ew dikenin.
Lê hê du pakêtên din jî hene. Ew jî li ser cîhê Mem-
duh Selîm Begê hatine danfn. «Ew jf ji bo xwişka me
ne.»
Xwişka me... yanê destgirtiya Memduh Selîm Begê.
Yanê Ferîha.
Xezalê.
«Hevalno!»
10
Oda otêlê. Destê sibê. Xewa şêrîn. Di xewa şêrîn de
65

xewnên neşêrîn. Pêlên derya xewnan bi ser Memduh
Selîm Begê re tên. Reng, tişt û bûyerên têkel. Xewn.
Du kevok. Du kevokên spî wekî berfê. Kevok ji de-
rekî dûr, ji pencereyeke nenas bi firê dikevin. Şev e,
heyveron e. Stêrk bi hev re dipeyivin û dilîzin. Kevok
berz, pir berz difirin. Stêrk dest li wan dikin. Ew gelî û
newal, der û dever, çol û çiyan li pey xwe dihêlin. Wi-
san dixuye ku kevok dizanin, ew ber bi kû de derin.
Ew ewçend dûr û dirêj difirin ku hawirdor reng diguhe-
rîne. Stêrk û heyv ji wan xatir dixwazin û diçin ava. Ji
aliyê rojhelat, li pey çiyayên asê tîrêjên rojê silav li wan
dikin. Ro hêdî hêdî li wan hiltê.
Ew difirin. Perwazên wan hêdî hêdî radibin û dadi-
kevin. Ew xwe naêşînin, nermik nermik, di nav asmana

bêdawî de sînga ewran diqelişînin û difirin.
Ew niha gihîştine rêzeke çiyayên asê. Di bin wan de zinar û kortal dixuyin. Serê çiyan di nava mij û dûmanê de ye. U berf. Niha jî çiyayên nas. Cîh û warê bav û kalan. Kevok niha di deverên nas de ne. Ew nizmahî li çiyan dikin, nizm, pir nizm difirin. Lê çiya jî hêdî hêdî li pey wan dimînin. Golekê. Yan jî deryakê. Piştî çiyan goleke stûr dixuye. Gol pir mezin e.
Belê, gola nas, Gola Wanê ye.
Tîrêjên rojê li ser avê dibiriqin û rengeke zêrîn tînin pê. Di nava Golê de giraveke hûr. Kew ber bi giravê difirin. Çend xaniyên kevnar û xirbe. Giraveke kavil.
Kew tên û li ser xaniyekî hilweşiyayî vedinişin. Cîhên nas. Ew avahiyên spehî niha bûne xirbe. Girava şêrîn niha bûye çoleke bêdeng.
Kevok li hevûdu dinihêrin, bi nikulên xwe yên biçûk stû û perwazên xwe şeh dikin û dîsan bi firê dikevin.
Ber bi aliyê rojhelat yê Golê. Ber bi hêlîna rojê. Roj niha h ber wan e û ew her ku dere stûrtir, germtir dibe.
66

Rojeke nû. Roja germ, ava zelal, ewrên spî. Her tişt, her tişt di nav xweşiyeke bedew de ye.
Qeraxa avê û daristana li rex avê dixuyin. Daristaneke hêşîn û bêser û ber. Kevok ber bi daristanê dadikevin. Ew niha ewçend ji nizm difirin ku carina perwazên wan bi pêl û şaxên daran dikevin. Ew bi qasî bîskekê li ser daristanê difirin. Bi dû re tiştekî nû dixuye; di nav

daran de xaniyekî hûr û xweşik. Kevok ber bi xênî di-
bin. Niha fahm dibe; kevok li pey vî xaniyê bûn. Xani-
yekî du qat û spî. Bexçeyeke gul û kulîlktijî li ber.
Di bexçê de jinekê. Jineke bedew û pordirêj. Rûyekî
nas. Çav? Belê, çavên nas. Çavên bi rengê genim. Çav bi
kevokan dikevin. Kêfxweşî. Dest hildibin. Kevok şa û
serfiraz, li hev dinihêrin. Belê, ev der bû ku ew dê biha-
tinayê. Belê, ev jin bû ku wan dê silav lê bikirina û li
ser milên wê veniştina... Ew gihfştin cîhê xwe. Bi tenê
du perwaz mane ku ew venişin ser milên jinikê.
Le!..
Agir, şewat.
Ji nişka ve agir bi daristanê dikeve. Agireke gur û
boş. Kevok vediciniqin. Ew, bê hemdê xwe, ber bijor
dibin. Daristan dişewite. Jinik? Xanî? Agir hemû daris-
tanê radipêçîne. Zû, pir zû. Pêtên êgir digihên xênîjî.
Agir bi xênî dikeve. Jinik, tirs li ser rû û veciniqî, li do-
ra xwe dinihêre. Ew nizane çi bike. Çi divê? Agir dor lê
digire. Çavên tirstijî li kevokan digerin. Ew dest li ke-
vokan dike. Hawar, hawarrrr...
Kevokên reben çi bikin? Ew dikarin çi bikin? Ew
hewl didin ku perda êgir biqelişînin û xwe bigihînin
wê. Lê nabe. Mixabin. Ax. Careke din. Careke din. Na,
nabe. Kevok bêgav dimînin û xwe bi şun de vedikişî-
nin. Gulokên êgir stûrtir û berztir dibin. Jinik direve vî
derî, wî derî. Lê nabe. Egir dor lê girtiye. Ax... Kevok

difirin vî derî, wî derî da ku riyeke felatê bibînin lê agir rê nade wan.
Di nav vê cehenema sor de tiştekî din jî diqewime;ji her aliyê asmên teyr dixuyin. Teyrên goştxwar, yanê dijminên kevokan. Teyrên reş, hulflik, baz, sipîr, doxan. Teyr, ref bi ref, bi ser kevokan re tên. Agir, teyr, jinik, bêgavî, tirs, mirin, germiya dijûnê. Na, na, na. Lê teyr tên. Ew qîje qîj dikin û tên.
«Na, na, na!..»
Xewnên neşêrîn bi ser Memduh Selîm Begê re tên. Ew vediciniqe. Celadet Bedirxan Beg jîbi dengê wf vediciniqe. Kirasê şevê yê Memduh Selîm Begê şil e. Ew di nav xwîdanê de maye. Ew diheze.
«Birayo, çi bû, çi qewimî?»
«Qet mepirse mîrê min, xewnên neşêrîn dev ji min bernadin, ji min nahewin.»
Ew radibe pê, çirê pê dixîne, «li min bibuhure mîrê min» û ji paketê du cixare dertîne. Yek ji xwe re û yek jî ji hevalê xwe re.
11
Dotira rojê. Memduh Selîm Beg rûnuştiye û name dinivîse. Ji hevalê xwe yê çerkez, xwezûrê xwe yê pêşeroj re. Di esasê xwe de wî dil heye ji destgirtiya xwe re binivîse. Lê ev yek hê ne li gor edetan e. Herçend mal û malbat têgihîştî û bîrewer bin jî. Ew niha, piştî şeva bihurî, pir dil dike ku hebûna xwe, dengê xwe biguhezîne mala xwezûran û Xezalê.
Lê ka keys?

Ew çi binivîse? Serî û mêjiyê wî, îroj, wekî kitêbxa-
neyeke wêranbûyî ye, peyv, qise tê de bûne tev li hev.
Ew, penûs di destan de, h kaxiza spî dinihêre. Nêçirva-
nî? Belê, wî nêçirvaniya peyvan divê.
68

Ew dikene, rojên bihurî bi bîr tîne. Ew sersala Stem-
bolê. Berf û kuliyên berfê. Lez û beza wî li pey kuli-
yan. «Sersaleke xweş bû.» Memduh Selîm Begê, eynî
wekî wê sersalê, niha jî nêçirvanî divê. Lê ne nêçfra ku-
liyên berfê, nêçîra peyv û qisan da ku mane, bîr û ba-
werî li ser kaxiza spî bixuyin. Da ku Xezalê û bav û di-
ya wê bi wî, bi dengê dilê wî bihesin.
Name divê bi rêk û pêk be. Ne kurt û ne jî dirêj. Ne
zêde germ û ne jî zêde sar. Ne qiseyên qelaw û xweş,
ne jî qiseyên jar û qels. Bi pîvan û li gor edetan; edebe-
ke edebî.
Lê tu peyv nayên ser devê penûsa xweşik. Ew penûsa
ku her gav, bi rehetî, li ser kaxizên spî direqisî, niha
kulek e. Eger ev name rast bi rast ji Xezalê re bûya, ni-
ha ji zû ve bû ku kaxiz tijî bûbûn. Hingê ji kêfa penûsê
re dê payan tunebûya. Lê niha?
«Mîrê min'ê ezîz,»
Paşê?..
Na, nabe. Fikir û guman tev li hev in. Mêjî nikare
nameyeke xweş biafirîne. Bi tenê silav û kilam. Hal,
hewal, xatir. Xweşiya Beyrûdê. Bêrî li wan kirin. «Ha-
lê min baş e, kêfa min li şûnê ye. Vegera min nêzîk e.

Ez dê piştî demeke kin vegerim.» Dîsan silav û kilam.
U? U «pir silav h Ferîhayê dikim û ji çavên wê yên
xweşik radimûsim.» Cîhê herî giring yê namê. «Çavên
wê yên xweşik.» Xweşik? Na, peyva xweşik zêde ye,
ew divê ji namê derkeve.
Piştî keft û lefta çend saetan name bi vî awayî tê ni-
visîn, bê ku tu peyvên li ber dilê Memduh Selîm Begê
ezîz in, li ser kaxizê bibiriqin.
12
Rojên dawîn yên Beyrûdê. Mala Xelîl Ramî Begê
69

Bedirxanî. Apê Sureya, Celadet û Kamuran Began. Ku-
rê serîhildana 1840-an ya Mfr Bedirxan. Milletperwerê
kurd. Merivdewletê Osmanî. Waliyê kevn yê wîlayeta
kurdî Meletyayê. Dijminê serokkomarê Tirkiyê Musta-
fa Kemal û hevalên wî. Yek ji ew 150 şexsiyetên ku di
sala 1923 an de bi destê rejîma Mustafa Kemal, ji welêt
hatin bidûrxistin. Dilbirîndarê welatê xerîbiyê. Hevalê
kevn yê Memduh Selîm Begê.
Kesên ku Partiyê şandibû welêt, vegeriyane. Yezdanê
mezin, îcar, pişt li wan banedaye. Kar û bar bi cîh bû-
ne. Navîn û qerergaha serîhildana nû û qumandarê serî-
hildanê bi rû bûne.
Navenda serîhildanê; çiyayê serîbilind Agirî, yanê A-
rarat.
Qumandarê serîhildanê; sereskerê serîbilind Ihsan
Nûrî.

«Mîrên min, niha hêviya min bi şoreşê pir e. Min baş hêvî bi şoreşa me heye. Eger meriv li heft dewêlan jî bigeriya, dîsan nikaribû ji Ihsan Nûrî çêtir fermandar bidîta.»
Agirî û Ihsan Nûrî. Serbilindiyên kurdan. Li ber şûrê Ruhistîn du pizotên pole. Du helqeyên esasî yên zincîra siûda Memduh Selîm Begê. Bûyer û wext wekî peykervanekî şekil û form didin jiyana Memduh Selîm Begê. Niha Agirî û Ihsan Nûrî jî dest pê dikin û di siûda wî de cîhên xwe werdigirin. Bûyer û wext, yanê tarîx û siûd. Ji milekî ve tarîx tora xwe ya rengîn dihûne û ji milekî ve jî siûda Memduh Selîm Begê dineqişe.
Pêta hêviyê niha li ser çiyayê Agiriyê pêketiye. Kes û hêzên çekdar yên kurd ber bi wê derê derin.
«Welat dikele. Millet bidarvebûna Şêx Seîdê gorbehîşt û 50 hevalên wî ji bîr nake. Xelk li pey tolhildanê ye. Li hember tirkan kîn û nefreteke boş heye. Lê
70

herweha tirs jî heye.»
Xeberdan bi vê şêweyê dirêj dibin. Plan û hesabên nû çêdibin. Kêfxweşî û hêvî, wekî lewheyeke xweşik, li wê derê, li oda rûniştinê ya Xelîl Ramî Begê hilbûye. Bi dû xeberdana çend saetan re heval û hogir, hemû bi hev re, ji mal derdikevin da ku bi hev re şiva êvarê bixwin. Lê berî derketinê, li ber derî Xelîl Ramî Beg ji dostê xwe yê kevn Memduh Selîm Begê tiştekî ku herkes lê difikire, dipirse.

«Memduh Beg, ka zewac kengê ye? Em dê kengê di daweta te de govendê bigirin?»
Zewac û dawet?
Deriyê yekbûna bedenan. Kona hezkirin û şehwetê. Wargeha abadîn ya domandina nifşan. Tora tovê. Edeta herî kevn ya merivahiyê. U ji bo Memduh Selîm Beg jî; yekbûna kevokan û Xezalê, ji şevên sar û neşêrîn rizgarbûn, bihûşteke hûrik li ser vî rûyê dinê avakirin û xwe -bi alîkariya xweşiyê- li hember derd, kul, bela û mûsîbetan ragirtin.
Lê kengê?
Memduh Selîm Beg divê guhdarî li dengine bike. Ew pêşî guhdarî li dengê dilê xwe dike û paşê jî li dengê mêjiyê xwe dike. Dengên dil û mêjî; berberiyeke stûr, berberiyeke malkambax. Kîjan deng? Ew bêtir li kîjan dengî guhdarî bike? Deng tên ber hev. Ew tên wezinandin.
«Mîrê min, ez jî nizanim, bi rastî nizanim... Em weha bê ser û ber, ketin ber pêlên xerîbiyê... û dever, meriv û dan û standinên nas şûna xwe berdan ji yên nenas re. Ez nizanim... pêşiya me nexuyaye. Bê mij û dûmanê ez tu tiştî nabînim... û me niha dest bi xebateke nû û hêja jîkiriye.»
Memduh Selîm Beg ewçend hêdî dipeyive ku Xelîl
71

Ramî Beg bi zehmetî dengê wî dibihîse.
«Lê Memduh Beg, xebata te rê li zewacê nagire.»

«Ez dizanim, mîrê min, dizanim. Lê ez naxwazim, qet naxwazim bikevim gunehê kesekî...»
Memduh Selîm Beg hem dizane, hem jî nizane. Ew weha dipeyive, lê dilê wî diguvişe. Ew niha guhdarî li dengê mêjiyê xwe dike, ne li dengê dilê xwe. Mêjiyê wî ye ku niha dipeyive, ne dilê wî. Ew dil û mêjiyê ku piraniya caran bi hev re yek in, niha ji hev veqetiyane, her yek tiştekî daxwaz dike. Berberiyeke nexweş.
Çima û heta kengê?
13
«Niha dor ya Iskender Beg e.»
Kar û xebatên pêşîn yên damezrevanên Partiya Xoybûnê xelas dibin. Gava yekemîn hat avêtinê. Ji bo gavên nû kar û bar li wan parve bûn. Ew dê, sibê, piştî nîvroyê, bi rê kevin. Herkes dê here cîhê xwe, bi hêviyeke nû, bi berpirsiyariyên nû û ji bo xebatine nû. Ew niha dîsan li hev civiyane da ku berî jihevûduveqetînê, ew qiseyên xwe yên dawîn bibêjin.
Herwekî Memduh Selîm Beg carina dibêje; hawayê civînê hîsî û sentimentale ye. Xelîl RamîBeg xeberdaneke nerm û germ kir. Gotara kalekî dewr û dewrandîtî; tecrubeyên kevn yên destpêka 1900'î, nezanî û neyekbûna gelê kurd, barên giran û daf û kemînên li ber pêşewa û şerwanên kurdan. «Hûn divê hay li xwe bin. Ji we pê ve tu kesên vî milletê, vî milletê belengaz û bextreş tune. Ji bo milletê me hûn, her yek ji we, wekî stêrkekê ne.»
Niha Iskender Beg dê bipeyive. Iskender Beg?

Iskender?
Iskenderê mezin. Şagirtê Aristoteles. Keysarê Yew-
72

nan û Mekedonyayê. Hosteyê şer. Şerbazê cîhanê. Hem dost û hem jî dijminê keysarê Iranî Dara. Dostê ziman û kulturên franî. Hîmdarê bajarê Iskenderiyeyê. Serdestê Babîlon, Susa û Persepolîsê. Hukimdarê welatê Iranî. Mêrê keça bedew, xezala Iranê Roxane, yanê mêrê keça keysar Dara. Damezrevanê yekitiya kulturên yewnan û îranî. Pireke zêrîn di navbera Rojava û Rojhelatê de.
Iskender Beg?
Delaliyê bav û kalikê xwe. Xortê bejnzirav yê bajarê kevn û rengîn Wanê. Efendiyê xortên kurd yên Stembolê. Pêxasê meyxanên Galatayê. Dilovanê dengên xweş. Hosteyê araqvexwarinê. Yek ji damezrevanên Komela Xwendekarên Kurd li Stembolê, HEVI, 1912. Nivîskar û berpirsiyarê kovara JIN'ê, 1918-19. Yek ji damezrevanên rêkxistina kurdî Teşkîlatê Içtimaiye û Kurd Tealî Cemiyetî. Aware û derbederê welatê xerîbiyê. Dildarê evînê. Xwediyê kevokên aşqê. U niha jî yek ji damezrevanên partiya Xoybûnê. Ronakbîrekî nûjen di navbera Rojhelat û Rojava de.
Yanê Memduh Selîm Beg.
Memduh Selîm Beg niha bûye Iskender Beg. Navê Iskenderê mezin niha li wî bûye. Damezrevanên Xoybûnê ji xwe re navine nehînî hildiçinin da ku ew û xeba-

tên wan yên siyasî neyên zanîn û dijmin wan û xeba-
tên wan nenase. Ew niha, her yek ji wan, dibin du kes.
Memduh Selîm Beg jî dibe Memduh Selîm Beg û Isken-
der Beg.
«Iskender Beg!»
Iskender Beg, kincên nû lê, radibe pê û ber bi masê
dere. Di wê navberê de, berî ku ew bigihê masa xeber-
danê, rojeke ji rojên Stembolê di serê wî de ji nû ve ve-
dije. Heş wî dibe Stembolê... Tarîx tora xwe dihûne, lê
73

carina bi eynf rengf. Sal 1913. Stembol, Şehzadebaşi.
Xaniyê komela kurd HEVI. HEVI komcivîna xwe çê-
dike. Salon tijî ye. Tevî gelek milletwekiliyên Osmanî
yên bajarên kurdan, pir mêvan jî hatine. Memduh Se-
lîm Beg, bi sifatê sekreterê komelê, radibe û dipeyive.
Ew di gotara xwe de rexne li mezinên kurdan jî digire
ku ew alîkarî li doza Kurdistanê nakin. Milletwekiliyên
kurd li dijî wîradiwestin. Xeberdan û munaqeşe germ-
tir dibin. «Xwendevan jî wekî her kesî, divê bi doza
milletê xwe ve rabin...» «Na, xwendevan divê bi tenê
bixwînin û pozê xwe nexin nav tiştan...»
Gava weha tê peyivîn, Memduh Selîm Beg destê xwe
dibe pozê xwe û dikene. «Pozê reben... Ma tu ne ji zû
ve ye, di nav tiştan de yî?»
Di wê navberê de Xelîl Ramî Beg jî radibe û dipeyi-
ve. Xelîl Ramî Beg hatiye guh bide xortan. Piştî xeber-
dana milletwekiliyan, ew xwe ranagire û radibe, dipe-

yive. «Memduh Selîm û hevalên wîrast dibêjin. Em divê piştgirtî li wan bikin. Ew payebilindiya milletê me ne.»
Niha sal 1927. Berî bîskekê Xelîl Ramî Beg peyivî û niha jî ew dê bipeyive. 1913 û 1927. 14 sal; xwîn, bi hezaran mirî, kuştî û şehîd. Rojên tarî. Rojên şeytanên sererd û binerd. Rojên şûrê Ruhistîn. Şerekî cîhanê û du serîhildanên kurd. Şikestina hêviyan. Bi hezaran, bi milyonan derew. Derewên stûr û qelaw yên dewletên serdest.
Digel ku tarîx carina tora xwe bi eynî rengî dihûne, dîsan jî, tê de guherînin tên pê. Carina guherînin xuyayî, carina nexuyayî. Yên nexuyayî li alîkî, yên xuyayî; ji roja komcivîna HEVI'yê heta roja îroj piraniya ew xortên ku bi heyecaneke germ li komcivînê beşdar bûbûn, hatin kuştin, hejmara «payebilindan» her ku çû
74

kêmtir bû û yên man, îroj, li Beyrûdê bi firê ketin û bûn «stêrk.» Memduh Selîmê wê rojê niha bû Memduh Selîm Beg û bi dû re jî Iskender Beg. Avdayên spf ketin porê wî û qermiçekên rû û enî bûn kûrtir û pirtir. Poz? Poz jî bû dirêjtir û kete nav pir tiştan.
U tiştekî din; ji wê rojê û vir ve, xeberdanên Memduh Selîm Begê bûn nermtir, germtir, bêtir kemilandî, hîs û henektijî.
Niha jî ew bi gotareke weha ve rabûye. Ew, her du destên wî li ser her du koşeyên masê, hinek xwarbûyî,

rûbiken, li hevalên xwe dinihêre û peyvan nermik,
nermik, li pey hev rêz dike. Peyvên bijarte, wekî ji des-
tê zêrîngerekî hoste afirîbin, germiyeke xweş direşîne
ser odê.
Axaftina wî dûr û dirêj, rengîn û mîsaltijî ye. Tê de
her celeb tişt, her celeb meriv hene; sixurên Sultan Eb-
dulhemîd, şerwanên Seleheddînê Eyyubî, qahpikên
Marki de Sade, îxaneta Brutus û gladyatorên Roma
kevnar, pezkoviyên çiyayê Sîpanê û Xecê û Siyabend,
hostetî û zêrîngeriya Ehmedê Xanî, mîrasên Mîr Bedir-
xanê Cizîra Botan, Ubeydullahê Nehrî, kurê Ubeydul-
lahê Nehrî Seyid Evdulqadir Beg û Şêx Seîdê rîhspîû
di dawiya axaftinê de jî çend rêzên Zerdeşt:
Berî her tiştî di fikirînê de du cewher afirîne ku cêwik in
Yek rindî ye, ya din jî xirabî, hem di fikirîn, hem di axaftinê de
Kesê zane rindiyê heldibijêre di kar, fikirîn û gotinê de
14
Roja dawîn.
Bargeheke xweş. Hîmdarên Xoybûnê, kincên wan
75

yên herî nû û paqij lê, li tenişta hev rêz bûne. Wekf za-
rokên ku bi hev re derketibin meydana cejnê. Rawestî-
na wan jî wekî zarokên cejnê ye. Rawestîneke sert, a-
wirekî hişk û cîddî. Eger merivekî nenas ji derve were
û li wan binihêre, pîrqfn dê pê bikeve.
Ev merivên mest û mezin, ev merivên navsal çi dikin?
Ew li hember sûretkêşekî rêz bûne û sûret dikişînin.

Yanê, xatirayeke ji rojên xweş yên Beyrûdê. Ispatekî jîndar ji gotina «kurd namirin.» Sûreteke ji çandina tovên nû yên hêviyê. U bê guman, bîr bi vê gotina Osmanî birin: «Geçmiş zaman olur ki hayali cihana bedel.» Yanê, wextine bihurî hene ku bi bîranîna wan bi cîhanekê ye.

Wext hê li wan nequlipiye. Iroj hê nebûye do, hê nebûye «rabirdû» û wexteke bihurî. Lê ew ji tecrubên xwe dizanin; îhtimala ji nişkekê ve ji dinê û ji jiyanê xatirxwestinê her heye. Prensîb û qaîdeyên xebata ku ew pê rabûne, weha ne. Mayin û neman. Helbet, şer ji bo mayinê ye. Lê belê, yan jî mixabin, şerê mayinê, her gav, îhtimala nemanê jî dihundirîne. Ev komeke meriv baş hay ji vê yekê hene. Ji lewre jî, ew dil dikin ku li pey xwe xatirayeke nemir berdin.

Evana, ev koma...

Hin ji wan bîrewer û ronakbîr, hin jî axa û şêx. Hin ji wan ji nîşandeka babilîska 20 an, yanê ji bajarên mezin û hin jî ji gund û şikeftên ji dinê bêhay. Hin ji wan hê nû bi taya evfnê ketine, hin jî, bêyî ku ew hay li taya evînê hebin, xwediyê zar û zêç. Her yek ji alîkî. Her yek bi awakî. Roj û meh wekî aveke zelal herikîn. Niha ew ji hevûdu vediqetin. Her yekî bêrî li tiştekî kiriye; zarokên çavreş, jinên stûna mal û konan, axa avis, hesp û mehînên rehwan, tifing û demançên zêrhêlî, spêdê çiyayên serîbilind, memikên berfîn yên keçên

bedew, ayet û hadîsên kitêbên muqeddes, bîhna mure-
kebê û dinya kitêb, kovar û rojnameyan, calvadosa
fransizî û Quartier Latin ya Parîsê.
U porê direj û çavên genimî...
Ew dê, îroj, piştf nîvroyê, di bin çengan de kar û
barên nû, ber bi cîh û warên xwe herin.
«Birayo, Memduh Beg, fermo were li nik min rûne.»
«Na mîrê min, spas, şûna min baş e.»
Ew bûne du qor. Qoreke li pê û qoreke rûniştî.
Memduh Selîm Beg li pê rawestiye. Celadet Bedirxan
Beg dil dike ku ew here û li qora pêşîn, li qora rûniştî
rûne. Lê, na, spas. Kêfa Memduh Selîm Begê nefsbiçûk
ji qorên pêşîn re nayê. Hoste, dezgedar, hesabdar, re-
mildar, lê belê, gavekê li paş, di qora li pê de.
Ji bo wî ya herî girîng rêveçûna kar û xebatê ye. Ser-
firazî û biserketin e.
«Bila her tişt bi dilê me be!»
«Bila Yezdanê pak û dilovan bi me û milletê me re
be!»
77

DI BIN SIYA EVINE DE

1
Traaay la laaay, traaay, traaay, laaay...
Dengê melûl. Dengê ku bêrî lê hatibû kirin. Çend roj,

çend meh bihurîn? Wekî ku babilîskekê bihurîbe! A-
xîr... Cihêbûn û hesret h pey man. Dengê germ, hêdî
hêdî, dîsan guh û dil vedigirin.
Bajarê biçûk: Antaqiye. Di bajarê biçûk de taxa bi-
çûk. Di taxa biçûk de xaniyê biçûk. Dana êvarê.
Memduh Selîm Beg li ber derî ye. Deriyê mala bavê
Xezalê. Deriyê ku vedibe mekana porê direj, bedena
spehî. Bi qasî bîskekê li ber derî rawestan. Di dest û
bin çengan de pakêt û tişt. Dinya bi mij û dûman. He-
wa girtf. Erd û kolanên şil. Rehma zivistanê.
«Ew dê min ji nû ve binasin?»
Hîs û pirsiyarên têkel. Şik, tirs û heyecan.
Teq, teq, teq...
Vebûna derî. Na, ne ew e. Diya wê ye. Jina dîndar.
Birca stûr ya edet û toreyan. Siya Xezalê, per û baskên
wê. Gakoviya mader. Bi çavên meraqtijî li mêvanê bê-
wext fekirîn. «Wê ez nasîm?» Keneke gulover li ser rû-
yê gulover. «Memduh Beg, Memduh Beg!..» Kêfxweşi-
yeke rasteqîn. «Fermo were hundir. Dinya sar e, li ber
81

derî mesekine.»
Derî, dîsan, li Memduh Selîm Begê vedibe. Hewayê
germ yê hundir. Bîhna şîveke germ. Dê li pêş, ew li
paş, bi hev re, derin odeya rûniştinê. Oda nas. Her tişt
wekî xwe, wekî berê. Deriyên girtî yên odeyên din.
Hal û hewal. Xweşî û rindî. Dewr û dewran. Lubnan û
Beyrûd. «Memduh Beg, ev bû demeke direj ku tu li

wan deran î. Me nema bawer dikir ku tu vegerî.» He-
nek. Henek? Hinek henek, hinek rastf û hinek jf tehdît
û îxtar. Li pey perda kena gulover awirê xwesuyan.
Ew jî baş in. Hal û hewalê wan jî di şûnê de ye. Cîh
li wan, hinekî, teng bûbû. Mêvanên wan hebûn. Ji de-
verên dûr, ji Stembolê. «Mfrê min?» Ewjîbaş e. Ewjî
divê niha were. Mamostayî wî, hinekî, diwestîne. Lê
xurbet, derd û bêgaviyên xurbetê!..
Pîrejin... rê lê vebûye. Ew dikare, bi vî awayî, bi sae-
tan, bi rojan bipeyive.
Hê jî dengê musîkê. Ma ew pê nehesiya ku Memduh
Selîm Beg hatiye? Deng wekî aveke zelal dewam dike.
Bîhntengî. Dîsan edet û tore. Nabe ku Memduh Selîm
Beg bang lê bike, wê bîne û li kêleka xwe bide rûniştin.
Pezkoviya devlêvebûyî! «Ax Memduh Beg, ev xerîbî.»
Xelkê bajêr û cîranan nasnekirin. Ziman û dijwariya zi-
manê erebî. Nerehetî û ecizkirina fransizan. Tengbûna
mitbaxê. Kevnbûna tiştên malê. Buhatî. Nebûna zad,
zebze û fekî. « Ax, Memduh Beg, ax, ka ew bazar û sû-
kên Stembolê ku tê de her tişt hebûn!»
Bêdengiya Memduh Selîm Begê. Awirê vala. Li dîwa-
ran, li xençerên ser dîwêr, li masê, li kursiyan, li xalîça
li erdê raxistî nihêrîn. Li ser masê jî pakêt û tiştên ku
Memduh Selîm Begê bi xwe re anîbûn.
«De rûnin, ez ji te re qahwekê dayinim ser êgir. Ji-
xwe şîva me jî li ser êgir e.»

«Gelek spas, eciz mebe, ez'ê herim.»
Di bidûrketin û ber bi mitbaxê bûnê de bore bora wê; «na, na qet nabe, em te nahêlin tu cîhî.»
Jineke xwedanzept û rept. Jineke xwedanqise û bixwebawer. Qumandar. «Xwedê me jê, ji demên wê yên pizotpêketî star bike.»
Xêzên ronahiyê. Di odeyên din de çira. Perda tarî ya êvarê dadikeve. Di oda tarî de bitenêbûn. Hîsê bitenêbûnê, hîsê jibîrbûyinê... Pencere û kuçe û kolanên hûr. Lezandina kesina. U di vê dana êvarê ya tarî û şilî de dengê musîkê. Lê kemançe ji nişka ve radiweste. Pise pis. Bi qasî bîskekê dengine; dengê feraqan, dengê lingan û rakirina tiştan.
Ew.
Di destan de lampayeke ronî, ew dikeve oda rûniştinê. Memduh Selîm Beg, ji cîhê xwe, radibe pê. Ew hêdî hêdî ber bi wî û masê tê. Siya ku bi dû wê re tê, hêdî hêdî mezintir dibe. Rû. Rû di nav ronahiyeke nedîtî de ye. Roniya çirê h ser mûjang, birû û por diçirûse. Rû li ber roniya çirê wekî binevşeke sor dixuye. Binevşa sor, Binevşa Narîn û Xezalê. Binevşa Narîn, yara Cembeliyê Hakkarê tê bîra Memduh Selîm Begê. Niha şerekî dijwar di navbera roniya çirê û porê zer de heye. Keneke dilovan li ser lêv û bîbûkên çavên wê ye.
Ew.
«Kek Memduh, tu bi xêr hatî.»
«Di nav xêrê de bî, Ferîha.»
Piştî ku ew çirê li ser masê datîne, destên wan digih-

hên hevûdu. Ev dem. Demeke kin û kurt, lê bi xweşiy-
yên bihuştê tijî. Dest çend car dihejin, wekîkuewdi-
xwazin ev dema şêrîn dirêjtir bibe. çavên kentijî li hev
dinihêrin. Lêv dihezin.
Germiyekê bi ser Memduh Selîm Begê re gêr dibe. E-
83

ger diya wê, birca stûr ya edet û toreyan, hema xwe
negihanda nik wan, Memduh Selîm dê ew hembêz bi-
kira. Bi her du destan. Pihêt. Hişk. Bi daxwaz û evîn.
«Memduh Beg, fermo, qahwe... Qahweya tahl. Tu di-
bfnf, min ji bîr nekiriye ku tu ji qahwa tahl hez dikî.»
Ken. Her sê bi hev re. Her sê bi hev re li ser kursiyan
rûniştine. Memduh Selîm Beg hal û hewalê wê dipirse.
Bersîva hergavî; başî û rindî. Ew hal û hewalê wî dipir-
se. Ne bersîva hergavî; kêfxweşiyeke boş wekî şelale-
yan, sihhetxweşiyeke rind wekîpole, seyehateke xweş
li Beyrûdê, h bajarê ku di nav ronahiyê de ye, bi elek-
trîk e. Ew kolanên fireh û dirêj, bexçeyên rengîn, der-
ya zelal, şêniyên pir, moda nûjen, maxazeyên mezin
yên fransiz, ermen û yewnanan ku li Beyrûdê ne...
Dora xeberdanê niha ya wî ye. Wî dor ji birca stûr
girt. Peyvên herî xweş li pey hev rêz dibin. «Hevalan ji
min re kinc û pêlavên nû kirîn... Wan ev pakêt jîji bo
te şandin.»
Çav li pakêtan vedigerin. «Kek Memduh, pir spas, ez
ji hevalên te re spas dikim.»
«Ma hevalên te çima ev zehmetî xwarin, ne hewce

bû.»
Stûna malê jî divê tiştekî bibêje. Naxwe ew dê çawan bibe birca stûr ya edet û toreyan? Ew tiştekî dibêje, lê tiştekî din qest dike. Bê guman, ew jî kêfxweş e, lê belê, ew kêfxweşiya xwe weha, bi qiseyên nerast nîşan dide. «Ne hewce bû...»
«Memduh Beg, Memduh Beg!..»
Bav jî hat. Bîvileke stûr û simbêlên ber bi jor badayî.
«Monsieur simbêl.» Navê wî dikaribû weha bûya jî. Dostê hêja, merivê dilsoz. Dîsan, ji nû ve, hal û xatir. Bi awakî kin û kurt.
Bav, dê, keç û zavayê pêşeroj. Tablo temam e. Ren-
84

gên cihê. Lê tabloyeke xweş û lihevhatî. Vebûna pakêt û tiştan. Pêşî pakêta Xezalê. Fîstaneke hewreşîmî. Dirêj û rengîn. Çar cot goreyên dirêj yên jinan. Spehî. Şaleke bi dest hûnandî ya ecemê û coteke guharên zêrîn. Ne bi tenê evçend; kitêbekê jî ji aliyê Memduh Selîm Begê. Kitêbeke fransizî li ser tarîxa kemançe, texlîtên kemançê û tevî bi qasî buhîst sonatan, şêweyên lêxistinê.
«Kek Memduh, kitab pir xweş e, lê ez bi fransizî nizanim.»
«Mîrê min dikare, carina, ji te re bixwîne.»
«Hay lo, ez dê, di vî umrê xwe de, li ber coga keça xwe rûnim û jê re behsa kemançan bikim? Hay lo...»
«Hingê ez dikarim, carina, ji te re bixwînim.»

Kitab û musîk. Riyên zîvîn yên sermestbûna ruhê merivan. Zimanên nêzîkbûna dilan. U hêncetên bihev-rebûnê? «Bi vî awayî, ez dê fransiziya xwe jî, di ware-kî din de, pêş bixînim.»
Ji pakêt û tiştan para bavê Xezalê qelûneke reş û stûr e. Qelûneke ku dûmana wê ji dûmana tifikekê bêtir e. Diya wê, birca stûr? Tisbfheke nod û neh libî. Ji bo dua, ayet, hedîs, nimêj û niyazan. «Memduh Beg, Xwedê ji te razî be, Xwedê bi te re be.»
Bi dû vebûna pakêt û tiştan re, civat, wekî her carî, dibe du bir. Jin ber bi mitbaxê, mêr jî ber bi hevûdu. Tiştên ku ew li ser bipeyivin, pir in.
«Hanim, Menduh Bey bu gece misafirimizdir.» Yanê, Memduh Beg îşev mêvanê me ye. «Piştî şîvê jî em dê araq vexwin. Ji niha ve cacixa wî çêkin.»
Tiştên ku ew li ser bipeyivin... Çi? Bê guman, Turki-ye, rejîma nû, bûyerên Turkiyê û xebata li dijî rejîmê. «Berî niha bi demekê, mêvanên me ji Stembolê hati-bûn. Muthiş, Menduh Bey, muthiş... Li gor ku mêva-
85

nên me digotin, tişt û pere li piyasê naxuyin. Xelk bir-çî ye. Her roj çend kesên muxalîf winda dibin, yan jî bi dar ve dibin. Mustafa Kemal her tiştî li gor xwe eyar dike. Ew bûye dîktatorekî wusan ku Siltan Ebdulhem-mîd li nik wî melayike dimîne. Xelk jê ne razî ye.
«Mîrê min, em kurd jî li hev dicivin. Me dest bi xeba-teke nû û bi rêk û pek kiriye. Ji niha ve eşîr, malbat û

bi hezaran kesên kurd ber bi me, ber bi xebatê dibin. Min hêvî pir e. Icar em dê tiştine xweş bînin pê. Veger nêzîk e, mîrê min, pir nêzîk e. Em dê vegerin welatê xwe.»

2

Anteqiye. Bajarê biçûk. Li bin bîvila Turkiyê. Wekî çîroka keçika biçûk û gurê devgirêz. Turkiye li bendê ye ku bajarê biçûk vegire nav tixûbên xwe û bajêr daqultîne.

Antaqiye, bajarê tarîxî. Warê Rom û Bîzansan. Yek ji navendên medeniyetên fille ya Rojhelata Navîn. Bajarê rengîn; ereb, ermen, suryan yewnan, tirk, çerkez û kurd. «Beldeyê Selametê.» Xiraxa deryayan. Deriyê deşt û zozanan. Çavnêrê fransizan. Di wextê xwe de, havîngeha Iskenderê mezin.

Warê jiyana Iskender Begê kurd, warê jiyana xerîb. Çar taxên mezin, mizgefteke mezin, çend dêrên biçûk, keleheke hilweşiyayî, kolanên fireh, aşxane, meyxane û qahwexanên hûr û parizgeha Zîrahî. Yanê bajarekî biçûk...

Di bajarê biçûk de meyxana biçûk û xweşik; «meyxana ermenan.» Mase û kursiyên textîn. Lê, neqişandî û cîlakirî. Li erdê xalîçeyên Wanê. Xalîçeyên ji deverên Memduh Selîm Begê. Li ser dîwaran lewhene spehî. Bi zimanên fransizî, erebî, tirkî û ermenîrêzên bi-

çûk. Li ber maseyan nêrgile û qelûn. Li ser maseyan

xwarin û vexwarin. Bilûrvanekî li ber dezgê rûniştiye. Bi kincên netewî yên ermenan. Bi dengê bilûrê musî-keke giran û melûl ya ermenan. Dûmana cixare, qelûn û nêrgilan. Ken, zimanên têvel.
U Memduh Selîm Beg û hevalê wî yê çerkez. Ew bi hev re rûniştine û vedixwin. Lê, ne araq. Tiştekî din yê balkêş; konyak. Konyaka ermenan. Xwediyê meyxanê ermeniyekî kal e. Ew ji deverên Wanê, dostê Memduh Selîm Begê ye. Jê re, ji Erîwanê konyakeke giranbiha hatiye. Ew jî dostê xwe yê ezîz Memduh Selîm Begê diezimîne.
Xwezûr û zavayê pêşeroj li hember hevûdu rûniştine û ji hev re tiştine dibêjin. Xwezûrê wî dil kiribû ku ew bihatina meyxanê. Wî dixwest -hinekî- bi Memduh Se-lîm Beg re bipeyiviya.
Çi?
«Memduh Beg, tu dizanî, berî niha bi demekê, mê-vanên me hebûn...»
«Belê mîrê min, we behs kiribû, mêvanên we ji Stembolê, ji bo serîdana we hatibûn.»
«Rast e, Memduh Beg. Lê mesele ne bi tenê serîdan bû.»
Yanê çi, hingê çi bû?
Memduh Selîm Beg napeyive, jê pirs jî nake. Ew, di dest de qedeh, bêdeng, li dostê xwe dinihêre.
«Lawekî wan heye. Wî nû xwendina xwe kuta kiriye û niha jî di eynî zanîngehê de, dest bi mamostetî kiri-ye...»

Memduh Selîm Beg qedeha destê xwe hêdî hêdî dibe devê xwe, çend qult ji konyaka xwe vedixwe û paşê jî, ji zeytûnên li ser masê du lib digire û davêje devê xwe.
«Lêwik zimanê almanî xwendiye. Ew xortekî jîr e.
87

Dema em li Stembolê bûn, tevî bav û diya xwe, ew dihat mala me.»
Memduh Selîm Beg dest davêje pakêta cixarê, «Mîrê min, tu jî dixwazî?»
«Na, Memduh Beg, spas... Memduh Beg... gotina min ev e; bav û diya lêwik hatibûn ku keça me, Ferîha'yê ji lawê xwe re bixwazin...»
Bêdengî. Bêdengiya mêjiyê Memduh Selîm Begê. Çi? Ferîha'yê xwestin?.. Ber bi Xezalê bûn? Daxwaza nêçîra Xezalê? Ji cixarê çend gulm. Çend qult konyak. Ew guliyên dirêj, ew porê zêrîn di nav destên hinekên din de! Lêvên biyanî li ser çavên germ, destên biyanîli ser bedena bedew!.. Na, na, nabe... Baş e, we çi got? We çi dil kir? Hûn çi difikirin? Mêjiyê Memduh Selîm Begê, bêdeng, pêl dide.
Memduh Selîm Beg, bêdeng, li dostê xwe dinihêre. Nêrîneke nerm. Nêrîneke rêz û rêzdarî û hawartijî. Hawar...
«Memduh Beg, tu hal û hewalê civata me dizanî, Gava keçikeke xama li mala dê û bavê xwe be, xelk tê û wê dixwaze.»
Memduh Selîm Beg dil nake ku devê xwe veke. Lê

şewata meraqekê bi canê wî ketiye; wan ji dê û bavê lêwik re çi gotin?
«Ne ku keça min e û ez ji ber vê yekê dibêjim, lê Ferîha keçikeke narîn û delal e. Di cihên biçûk, wekî van deran de, keçên weha pir ber bi çav in. U kesên ku çav berdidinê, pir in.»
Dengê bilûrê. Dengê bilûra kalemêrê bilûrvan. Dengekf giran û melûl. Dengê derd û kulan. Dengê serpêhatiyên malkambax. Dengê bextreşî û şînê. U konyaka germ. Di demên weha de, hîs û heyecanên tenik û zîz dilê Memduh Selîm Begê vedigirin. Ew dibe melûl û di-
88

lovan. Kelgirf. Çima di meyxanê de musîkeke weha tê lêxistin? Ma li serê cîhanê meyxaneyeke din jf heye ku tê de bilûr lêdikeve?..
Memduh Selfm Beg, niha jî, bi awakî melûl û dilovan, li şûşe û qedeha ber xwe û li dostê xwe dinihêre.
«Memduh Beg, bê guman, me, bi zimanekî xweş, ji wan re da zanîn ku Ferîha destgirtî ye û me tu daxwazên weha ne qebûl in. Lê ne bi tenê ew, herweha gelek kesên din jî tên û Ferîha'yê dixwazin. Em, nemaze diya keçikê bi vê yekê eciz dibe. Jixwe, wê xwest ku ez werim û bi te re bipeyivim. Tu jinên me dinasî... Ew her şev tê û li ber guhê min pise pisê dike. Ew dixwaze ku mesela zewac û mahrbirînê rojeke zûtir hal bibe...»
Belê, ew deqîqe, ew gav jî hat. Gava ku Memduh Selîm Beg hê jî nedipa... Hevûdudftin, taya evînê, firîna

dil, destgirtîbûn û niha jî gava nû; zewac. Wekî her tiş-
tî, evîn jî xwedanqaîde ye. Ji wan qaîdan revîn nabe.
Evîneke bêsînor, bêqaîde... Ev yek ne li gor edetan e.
Ne li gor edetan e ku keçikeke ciwan, bi dirêjahiya sa-
lan, li mal be.
Baş e, niha?
«Mîrê min, ma ez naxwazim? Ferîha li ber dilê min
pir ezîz e. Ez jî dil dikim ku em rojeke zûtir zewaca
xwe bi ser xînin... Ez kar û şuxilên xwe bidim hev, hi-
nekî bîhn h min fireh be û ez der û dorên xwe bibî-
nim, hingê em dê vê meselê jî çareser bikin.»
Memduh Selîm Beg bi dilekî germ û seriyekî germ-
bûyî dipeyive. Lê peyvên wî ne zelal in. Kar û şuxil,
bîhnfirehî, der û dorên xwe dîtin... Yanê çi? Heta ken-
gê? çiqas?
3
Mal; du ode, saloneke dirêj, mitbaxeke biçûk. Tiştên
89

tê de; h salonê maseyeke dirêj û çend kursiyên textîn,
li erdê xalîçeyeke fireh ji Kermanşahê, li quncikekê du
doşegên fireh û çend bahlîf li serê, li ser dîwêr lewhe-
yeke keleha Wanê, lewheyeke bircên Stembolê û di
navbera her du lewhan de, hinekf ji wan jor, du sûret,
yek ya Şêx Seîdê Pîranî û yek jî ya Kemal Fewzî ku
her du jî berî du salan, li Diyarbekirê bi dar ve bûn. Li
koşa binê lewhe û sûretan qenepeyekê û li nik qenepê
jî dolabeke hesinî. Li oda razanê texteke fireh ji bo du

kesan, li ser dîwêr du xalîçeyên rengîn û biçûk, li nik textê maseyeke biçûk û li ser masê kitêb û kovarin. Ji çend kitêb, kovar û rojnamên ku peregende dixuyin pê ve, h oda din tu tişt tune. Ode ji bo kitêb û weşînan hatiye veqetandin. Lê, ode hê vala ye. Li mitbaxê jî çend firaqên pêwist dixuyin.

Maleke feqîr û sade. Li welatê xerîbiyê maleke xerîb. Maleke ku destê jinan pê neketiye. U tekberên malê yên sade û feqîr.

Memduh Selîm Beg li mala xwe rûniştiye. Li ser masê name, rojname, kitêb û bi tomaran kaxiz.

Jiyana rojane, jiyana siyasî û jiyana evîn û evîndariyê; ev her sê bûne helqeyên zîncîra jiyana Memduh Selîm Begê. Hemû tomarên kaxiz û kitêbên li ser masê di derheqên van helqan de ne. Nameyekê bi fransizî ji muduriyeta navîn ya terbiye û perwerdeyî hatiye. Name kurt û hişk e; «Monsieur Memduh Selîm, li gor agahiyên ku gihîştine me, Hûn di navbera van tarîxan de(tarîx bi reqemên romî) li ser karê xwe nebûne. We ji bo du hefteyên pêşîn karbidestên xwe agahdar kiriye. Lê, ji du hefteyên pêşîn û pê ve, tu agahî negîhane destê karbidestan... Me ji bo vê yekê agahî divên... Ji lewre, em ji We daxwaz dikin ku Hûn di demeke kurt de sebebên li ser kar nebûnê, bi niviskî, ji me re bidin

90

zanin...»

U silav û daxwaziyên serfiraziyê. Bê guman, silav û

daxwaziyên derewîn. Di esasê xwe de, daxwaza çavnêrî û îdarekirinê.
Memduh SelîmBeg divê bersîva namê bide. Ew divê erkê xwe yê rojane bi cîh bîne. Ji bo ku helqeyên din neyên şikestin, têk nerin, ew divê helqa jiyana rojane pihêt pêgire û wê ji destê xwe bernede. Ji bersîva namê pê ve, ew divê beşdarî li çend civînên mamostan jî bike û raporekê li ser nûkirina xebata mamostetî û perwerdeyiyê binivîse.
Di nav tomarên kaxizan de bi qasî 20-30 navnîşan. Navnîşanên kurdên ku h Ewrûpa û Amerîkayê dijîn. Wan jî agahî divên. Xebera pîroz divê bigihê wan jî. Ruh û mêjiyên wan jî divê bi xebera xweş were vejandin. Bi kurtebirf, ji wan re name divê. Nameyên wekhev. Germ, xurt, xweş û pêlbilind. Pîrozbahî, agahî h ser Xoybûnê, destpêka xebata muqeddes, pêwistiya xebata li ser riya serfirazî û rizgariya welêt û millet...û alîkarî li xebatê kirin. Ew divê van nameyan jîbi tirkî û fransizî binivîse.
«Hevalê hêja û qedirgiran... pîroz be, çavên te ronî bin... Zarokê ku em li hêviyê bûn, hat dinê. Zarokê ku me, millet û welatê me bicivîne ser hev, dest bi jînê kiriye. Zarokê ku namûs û şerefa welatê me biparêze, îroj li ser piyan e. Ev zarok heyina me, hebûna me ye. Ev zarok XOYBUN e... lê xwedî derkeve, alîkariyê bike, di kar û xebatên wî de beşdar be...»
U bi dû van gotinan re jî erk û xebatên ku divê bi cîh werin.

Ji nameyan pê ve, ew divê çend nivîsar jî li ser rewşa welêt binivîse da ku Partî, yanê Xoybûn wan nivîsaran ji hukimatên Ingiliz, Fransiz, Italî û Amerîkî re bişî-
91

nin... Erkên helqa jiyana siyasî îroj, bi tenê îroj, ev in. Helqa jiyana evîn û evîndariyê?
Evîn... Çar tîp: E-V-I-N. Peyveke hûr. Lê jiyaneke, dinyake ewçend stûr, ewçend dewlemed ku emr têra wê nake. Peyv têr nakin ku wê bidin zanfn. Mêjî têna-gihê ka ew çi tişt e. Dil, bi tenê dilê reben, wê dijî, wê dilop bi dilop vedixwe, wê dide ber beroşk û germiya rehên jiyanê.
Evîn, dil û peyv. Peyv divê ji bîr nebin... ew kinc û libasên xweşiyan in. Ew xwe, her û her, diguhezînin di-lê sermest û wî geş dikin.
Memduh Selîm Beg bi vê hunerê dizane. Ew dizane ka dan û standina dil û peyvan çawan e. Ji ber vê yekê jî, ew her li pey wan peyvan e ku dil pê geş dibe.
Niha? Işev? Gelo di nav tomarên kaxizan de peyvên weha jî hene? Çawan tune! Celeb bi celeb. Bi her zi-manî. Ev sê kitêbên li ser masê jê re, ji Fransê hatine; Novembre, L'Education Sentimentale û Madame Bova-ry. Sê kitêb, sê çapên nû ji nivîskarekî frensewî yê sed-sala 19 an; Gustave Flaubert. Sê roman ku dil pê geş dibe, pê perwerde dibe. Ew li ser masê, li benda dengê dilê Memduh Selfm Begê ne.
Sê helqe, sê stûnên jiyanê. Keft û leftên rojê. Dengê

dil û kevokên evînê û welat. U welat, sebebê hebûna her tiştî.
Dinya ecêb, jiyana tev li hev. Daxwazî û hîsên têkel. «Way li min!.. Çerxa dinê û felegê... daf û kemînên jiyanê... way li min.»
Ma çima ev dinya malkambax her roj, xwe bi hêstirên çavan dişo û xwe bi nalîn û hawarên dilsoj zuha dike?.. «Wisan dixuye ku çerxa felegê şikiyaye, dinya, bi lez û bez, ber bi derina gêr dibe... û em j'î divê xwe bigihînin vê lez û beziyê... Çima?»
92

4
Sersaleke nû. Sersala 1928 an. Sersalên welatê xerîbiyê. Ev bûn çend sersal? Hîn çend sersalên din divên? Xwezûr, xwesî, bûk û zava. Yanê monsieur simbêl, gakoviya mader, Xezala çavgerm û evîndarê xweşî û rindiyan. Sersala nû bi xeberên nû û xweş dest pê dike; kitêbên Memduh Selîm Begê ketine rê û ber bi Anteqiyayê tên. Bav û diya Xezalê dê herin Urdinê, nik merivanên xwe. Xezalê dê, li mal, dest bi xwendina fransizî bike. Li gor biryara Muduriyeta Navîn ya Terbiye û Perwerdeyî, Memduh Selîm Beg dê karê xwe bidomîne.
Xwezûr dil hebû ku wan şeva sersalê bi hev re derbas bikirina. Memduh Selîm Beg dê, di esasê xwe de, biçûya Helebê, nik hevalên xwe. Lê li ser daxwaza hevalê xwe, ew h Anteqiyayê ma. Wekî her carî, bav û dê li

hember hev û Memduh Selîm Beg û Xezalê jî li hember hev rûniştine. Xwarinên herî xweş li ser sifrê ne. Bê guman cacix û tebûleya Antaqiyayê jî ku Memduh Selîm Beg jê pir hez dike.
Memduh Selîm Beg kincên xwe yên nû li xwe kiriye, -ew kincên ku hevalên wî dabûnê. Xezalê jî kincên nû li xwe kiriye.
Kêfa Memduh Selîm Begê di dewsê de ye. Evîna wî, sewda xweşik li hember wî rûniştiye û ronahî direşîne ser masê û odê. Ji vê xweştir çi heye? Ew hay lê ye; di jiyana wî de rûpelên nû vedibin û ew ber bi derên nû gêr dibe. Carina wî dil dikir ku jiyana wî wekî riyeke rast bixuya. Wekî riyeke rast di deşteke hêşîn û ronî de. Yanê riyeke rast û têkûz. Ne zîk-zak, ne kort û çal, ne xaçerê. Lê pêlên xerîbiyê riya jiyana wî, ji binî, tev h hev kir, daxwaza wî qurmiçand. Di ser de jî, di welatê xerîbiyê de, ew rastî xezaleke çerkez hat. Pêşî taya welatê xerîbiyê û paşê jî taya evînê. Yanê du ta-
93

yên pir ji hev cihê ew sermest kir. Ji wê rojê û vir ve ye ku riya jiyana wî wekî riyekê ku di nav daristan, zinar û newalan de dibihure ye. Yanê riyekê ku di nav rengên têkel de ye.
Ew niha li ser wê riyê ye û her dere. Ber bi hem amanc û hedefên rojane û hem jî yên dûr û dirêj. Ber bi serfiraziyê, ber bi azadiyê, ber bi serketina dil. Lê belê, li milê din, mij û dûmanê riya wî vegirtiye. Dar û daris-

tan, çiya, zinar û şikeft li ber wî ne. Ev rêwîtî dê li kû û çawan biqede?..
Ma niha wexta pirs û gumanên weha ye! Rûyê ronî û çavên stûr lê dinihêrin. Germiyekê ku bi demeke dirêj jê bi dûr bû, bi ser wî re tê. Ew dipeyive, tiştina dibêje. Lê peyvên wî ewçend bi best in ku wekî ku ew ji kûrahiya dil tên. Peyvên wî wekî kahniyeke boş, germ û zelal diherikin. Rûyê ronî bîhnvedanek, ferrehiyek, rehetiyek, sermestiyeke xweş bi ser wî de tîne û beden û zîhnê wî bi vê yekê vedije, zînde dibe.
Ev çavên li hember, ev rû û bedena li hember dilê wî vedigire. Belê, êdî baş dixuye, êdî eşkere ye;Xezalali hember rûniştî pê h deriyê dilê Memduh Selîm Begê dike. Ew dê bibe stûna mala wî. Ew dê ronahî bireşîne ser jiyana wî. Di rojên teng û reş de, ew dê were û pişt bide Memduh Selîm Begê, jê re bibe alîkar, heval, hogir û yar.
5
Kitêb. Dinya kitêban. Dinya bi sihêr û keramet. Rê û xaçeriyên ku di nav rûpelan de dixuyin. Zane, qehreman, tirsok, şerwan, qeşmer, parsek, hukimdar, qahpik, xweşik, fetbaz, nexweş, dîn, xwînrêj, gêj, fêsad, sêwî, keçel, alîm, evîndar û dilsojên ku ji nav rûpelan derdikevin û tên bi xwendevan re dipeyivin. Cîh û wa-
94

rên ku di nav rûpelan de diçirûsin. Ziman, edet, tore û çandên biyanî ku ji rûpelan, ji xwendevan re dibişirin...

Tîpên cihê; erebî, latînî, kirîlîkî. Peyv û cimle. Rêz. Nav, sername. Xwendin;ji aliyê rastê ber aliyê çepê û ji aliyê çepê ber bi aliyê rastê. Xwendin; di nav rûpelên rengîn de rêveçûneke bêwestan û bêpîvan.
Kitêb. Yara bêhempa. Dosta bêziman. Hogira zanînê. Belê, kitêbên Memduh Selîm Begê hatin. Ew ji Stembolê bi rê ketin û piştî bi dehan macere û tehlûke, wan xwe gîhandin Antaqiyayê. Dostên kevn, Memduh Selîm Beg û kitêb gihîştin hev. Ew oda ku vala bû, hew stûxwar e. Ode dê bi kitêb, kovar û rojnaman bineqişe. Gava kitêbên Memduh Selîm Begê di nav telizan de wekî girtiyan hatin, wî hema baz da û çû nik necarekî. Jê re, ji kitêban re, ji dostên abadîn re ref diviyan. Ref çêbûn û hatin odê. Niha Memduh Selîm Beg divê kitêban, yek bi yek, ji taritiya telizan rizgar bike û wan rêz bi rêz dayine ser refan. Ew hêdî hêdî xwar dibe û destê xwe dixe telizekî û jê kitêbekê derdixe; cîldekî Ansiklopediya Diderot, bi fransizî. Piştî ku ew cîldê Ansiklopediyê bi paçê şil yê destê xwe, xweş paqij di-ke û wê datîne ser rêf, ew destê xwe davêje telizekî din; cîldekî Dîwana Hafiz, bi farsî, lê bi şerhên fransi-zî. Telizekî din; kovarên ROJI KURD, cîldkirî, ku di sala 1913 an de, li Stembolê weşiyabû. «Ax... ka ew roj li kû ne?» Kitêb, kitêb, kitêb. Bîhna wan ya taybe-tî. Toza wan ya taybetî û tenik.
«Hezar hemd û spas ji Yezdanê pak re. Hezar hemd û spas ji bextê rind re...»
Iroj ji kêfa Memduh Selîm Begê re payan tune. Iroj

yek ji wan rojan e ku ew xwe evçend mesûd, bextiyar û serfiraz hîs dike. Ew ji kitêbên xwe, penûs û kaxizên xwe yên spî hez dike. Ev hemû tişt alet û hacetên wî
95

yên xwenasîn û zanînê ne. Ma ne ev kitêb bûn ku ew jê hîn bûbû ka ew kf ye, ka bav û kalên wf Med, Kardûk, û Kurd kî ne? Belê, kitêb bûn ku alîkarî lê kiribûn. Ew ji kitêban hfn bûbû ku merivahî, dilovanî, welatparêzî û welatevînî bi ser her tiştî re ye. Ew ji kitêban hîn bûbû ku ronakbîrekî sedsala 20 an divê dil û mêjiyê xwe bixe bin xizmeta welêt, millet û merivahiyê. Bi xêra kitêban e ku ew dizane ka ferqên dengê bilûrê û dengê kemançê çi ne, ferqên dastaneke kevnar û romaneke nûjen çi ne,.. (Ew hem ji dengê bilûrê û hem jîji dengê kemançê, hem ji dastaneke kevnar û hem ji romaneke nûjen, hem ji stranên dengbêjekî û hem ji resîtalên oparetekê hez dike. Lê ew bi xêra kitêb û tecruban ferqên wan jî dizane.) Ew ji kitêban hîn bûbû ku meriv, li her derê cîhanê, çi bigire eynî tiştî dijîn û hîs dikin, lê bi kincine cihê yên netewî û herêmî. Bi xêra kitêban ew têgihîştibû ku dastanên yewnanan, aztek û ankan, çîn û japonan, sorik û reşikan û yên kurdan wekhev in. U ew ji kitêban -baş- hîn bûbû ku meriv dikarin hem bibin zane, şareza, jêhatî, comerd, qedirgir û qedirgiran û ziravbihîstiyar û hem jî bibin namerd, nizm, sextekar, cahîl, durû, kirêt û dijminê merivahiyê. Hoste û mamostayên wî niha li mala wî, li nik wî ne.

Ew dê, niha, dîsan, bi hev re bijîn. «Xwediyo, çi kêf-xweşiyeke mezin!..»
Lê digel kêfxweşf û bextiyariyê, siya xemgîniyê jî di odê de dixuye. Kitêbên Memduh Selîm Begê jî, wekî wî, neçar û bêgav man. Wan jî, wekî wî, dev ji welêt berdan, cîhên nas li pey xwe hîştin û ketin ber pêlên malkambax yên welatê xerîbiyê. Ew jî niha, wekî wî, bûn xerîb û bêkes. U ya herî girîng, bi hatina kitêban, benekî din ji wan benên ku peywendiyên wî bi welêt re tînin pê, şikest. Ev benên hanê roj bi roj teniktir û
96

kêmtir dibin. Li milekî hesret zêdetir dibe, li milekî jî benên peywendiyê kêmtir û teniktir dibin.
«Ma ev siûd, siûda kesên ku ji ber bêgaviyê derketine welatê xerîbiyê, ye?..»
Hê gelek zû ye ku Memduh Selîm Beg, niha, bersîva vê yekê bide û bibêje «erê» yan jî «na». Ji bo bersîv-danê wext, tecrubên nû, bûyerên nû divên. Mij û dû-mana ku li ser riya wî ye, divê belav be û hawirdor, hi-nekî, zelaltir bibe...
Lê belê, niha pirsa esasf ev e; ew dê kitêbên xwe ça-wan li ser refan rêz bike? Li gor zimanan? Li gor nivfs-karan? Li gor babetan? Li gor tîpên erebî û latînî, bi gotineke din, li gor xwendina ji aliyê rastê yan jîji ali-yê çepê? Li gor çi? Pirseke dijwar... Ji bo vê yekê jî pa-yin û wext divê. Welê baş e ku ew kitêban ji telizan derxîne, wan paqij bike û bi awakî peregende li nik

hevûdu rêz bike. Paşê jî, gava wî biryara xwe da, ew di-
kare wan li gor qaîdeyekê, ji nû ve, rêz bike. Niha kitê-
ban, bi tenê, ronahî û hewa paqij divê. U wî jî wan ji
nû ve dîtin...
«Hosteyên min, dostên min, zarokên min...»
6
Memduh Selîm Beg, di destan de hejmarên kovara
ROJI KURD, li mal rûniştiye û difikire. Rûpelên kova-
rê ji niha ve zerbûyî ne. Rûpelên qedirgiran û bi xatire-
tijî. Di rupelan de nivîsarên nas, xwediyê nivîsar û ben-
dan navê nas. Nivîsarên wî bi xwe. 4 Hejmar. Bi kurdî
û tirkî. Bi tîpên erebî. Dewreke xweş, geş û hêvîtijî.
Ew di nav fikir û gumanan de ye. Derd û keser dor lê
girtine û bi ser wî re tên. Şopên qermîçekên derd û ke-
seran niha li ser rû û eniya wî hiltên. Çav kelgirî ne. Ew
h rûpelên kovarê, li kitêban, li odê dinihêre, nefeseke
97

kûr digire û dide û bi dû re jî, ew bi firê dikeve û dere
rojên rabirdû .
Stembol, 1912. Fîzîna baya azadî û serbestiyê. Hiş-
yarbûna gelên bindest yên dewleta Osmanî. Dewleta
Osmanî ya nexweş. Di nav fîzîna baya azadî û serbestî
de kurd. Gire girên kurdan. Malbatên kurd yên herî
mezin; malbata Ubeydullah Nehrî, malbata mîrê Botan
Bedirxanî, malbata mîrê Kurdistana başûr, Şarezor û
Sulêymaniyê, Baban. Hemûyan jî li dijî dewleta Osma-
nî serî hildane, bi ser neketine û ji welatê Kurdistanê

hatine bidûrxistin. Hemû jî, niha, li Stembolê, di bin çavnêriya dewletê de dijîn.
Stembol. Pira navbera Ewrûpa û Asiyayê. Warê îlim, îrfan û zanînê. Xortên kurdan. Xwendevanên ji malên dewlemend. Qahwexana Ebdullah Çawişê Erxeniyî. Xeberdan û munaqeşe. «Ma kurdan jîji awayê azadî û serbestî sûd wergirtin navê?» Ronakbîrê kurd Xelîl Xeyalî û Zanîngeha Zîra'tê ku Xelîl Xeyalî lê kar dike. Çend kurdên din; Qedrî, Ekrem û Omer Cemîlpaşazade, bajariyê Memduh Selîm Begê Fuad Temo, Cerahzade Zekiyê Diyarbekirî û Memduh Selîm Beg.
Havilê hevûdîtin, xeberdan û munaqaşan; Komela Xwendevanên Kurd HEVI. Roja damezrandinê; «HEVI, hêviya me ye.» «HEVI, hêviya pêşeroja welatê me ye...»
bijîjkekî kurd, Memed Şukrî Sekban,
Bi alîkariya
cîhekî ji bo komelê. Li Sirkeci'yê, li hember postaxana nû, di xaniyê Erzurimiyan de. Kêfxweşî û serbilindî. Geşbûn û pêşveçûn. Dîsan xeberdan, munaqaşe û pirs. Pirsiyarên nû. «Ma kurdan weşîn û kovar û rojname navên?..»
ROJI KURD.
Ew rojên rengîn yên weşîna ROJI KURD. Destpêka
98

havîna 1913 an. Doxtor, profesor, nivîskar, rojnamevan, mîr, axa, şêx, karker û xwendekarên kurdan. Dr.

Abdullah Cevdet Beg. Rûyekî pak, rîhekî spî, eniyeke stûr û vekirî. Idarexana kovarê. Her du destên dr. A. Cevdet Beg tijî ne; di destekî de çend hejmarên kovara ku ew diweşîne, IÇTIHHAD û di destê din de jî nivîsarekê ji bo hejmara yekemîn ya ROJI KURD. Ew hê nû ji Ewrûpayê, ji warê xwe yê xurbetê hatiye. Kincên li serê ewrûpayî ne. Gava ew nivîsara xwe dide berpirsiyaran, ew bi dengê xwe yê gur weha dibêje;
«Filhakika, her hal ve şartta Kurt munewer ve muteffekirlerinin varligini cihana gostermek mecburiyetindeyiz.» Ew bixwe kurdê Arabgirê ye, lê bi kurdî nizane. Loma ew bi tirkî dipeyive. Ew dibêje; «Rastî ev e ku em divê di her hal û şertf de nîşanî cihanê bidin ku ronakbîr, zane û alîmên kurdan jî hene.»
Nivîsara wî bi tirkî ye. Nivîsareke kin û kurt, lê pir xweş, baş lihevhatî û manetijî.
«Hem berhemên penûsê, hem berhemên fikir, li dinyayê tu eser û berhemên mezin tune ku bi alîkariya cesaret û xurtiyeke mezin nehatibe pê. Ez bi dil û can 'prensîba' hanê ji xortên kurdan re tawsiye dikim. Em di dema xwedanşexsiyetbûn û xwenasîna milletan de ne... gava neteweyekî ne xwediyê şexsiyetekî xurt be, hingê 'navê wî nayê xwendin', ji heywanekî xwedanziman pê ve, ew nikare tu tişt be. Ji bo merivan fikirîn û bîrbirin çi ye, tarîx jî ji bo neteweyan ew tişt e... Sedsala me, ne henek e, sedsala 20 an e...»
Dr. Abdullah Cevdet Beg...
U Kemal Fevzî... Dostê giranbuha. Meriv. Tîmsalê

merivahiyê. Wekî stêrka Kerwankuj ronî, wekî ava Fi-
ratê zelal û xurt. Ew û Memduh Selîm Beg. Piştî nivi-
sîn û raxistina rûpelên kovarê, bi hev re, ber bi meyxa-
99

nên Galatayê çûyin. Rêveçûnên destê sibê. Bi kêf û he-
nek. Bi ken. Bi mehan li nik hev mayin. Dostî û birati-
yeke zêrîn... Kemal Fewzî.
1912-13 û 1928. Dr Abdullah Cevdet û Kemal Fewzî
niha li kû ne? Dr. Abdullah Cevdet li Stembolê, li mala
xwe, bêdeng rûniştiye û ji derd û keseran, xwîn vediri-
şe. Kemal Fewzî jî li gorê, di bin axa sar û reş de dina-
le. U hevalên din?..
Memduh Selîm Beg, di destan de hejmarên kovara
ROJI KURD, li welatê xerîbiyê, li mala xwe rûniştiye
û difikire. Di nav bêdengiya hawirdor de, çend hêstir,
hêdî hêdî, ji çavên wî ber bi jêr dibin û direşin ser rû-
pelên ROJI KURD. Rûpelên zerbûyî bi hêstirên çavên
wî şil dibin.
7
Teq, teq, teq... Dengê derî.
Ew.
Tep, tep, tep... Dengê dilê Memduh Selîm Begê. Ew
ber bi deriyê derve dilezîne. Derî vedibe. Ew, Xezalê.
Siûda rind. Kê dizanibû, kê remil avêtibû û gotibû ku
Xezala Memduh Selîm Begê dê, rojekê, bipengize û we-
re ber deriyê wî?.. Ev cara yekemîn e ku Xezalê pê li
sûkûna deriyê mala wî dike. Ne li gor edetan e ku ke-

çikeke xort, bi tena serê xwe, were mala destgirtiyê xwe.
Rûyê wê yê bi ken û şermok. Gum û henarokên sor. Por bi tûleke reş girtî, beden bi çarşefeke reş pêçayî. Li der, li ser sînga kolanan govenda baranê. Derî baş vedibe û ew, bêdeng, lingê xwe yê rastê davêje mala Memduh Selîm Begê.
«De zû were hundir, tu şil bûyî.»
Çarşev û tûla reş jixwekirin. Li dor xwe nihêrîn.
100

Memduh Selîm Beg, destgirtiyê wê, merivekî rind û dil-pak. Lê belê, ji vê yekê pê ve? Ew kîye, di vê malê de bi tena serê xwe çi dike? Ew çi dil dike? Ew çi difikire? Çend pirsiyarên ku ew lê difikire û hênceta ku lingên wê ew aniye ber deriyê wî. Xezalê jî Memduh Selîm Begê, ji nêzfk ve nasîn divê.
«Fermo, were salonê û xwe bide ber êgir. Mixabin, mal sar e.»
Li nik dolaba hesinî, li erdê mankaleke hesinî û tê de çend lib komir ku diçirûsin. Memduh Selîm Beg radihi-şe du kursiyan û wan tîne ber mankalê. Ew li her du rexên mankalê, li hember hevûdu rûdinin. Di destekî Xezalê de kitêba ku Memduh Selîm Begê dabûyê, he-ye.
«Dinya sar e, baran jî nasekine. Lê li gor radiyoya fransizan, bi dû baranê re, hayameke xweş û germ dê were... Rast ji bav û diya te çi xeber hene?»

«Belê, berî niha bi du-sê rojan, me ji bavo û dayê nameyekê wergirt. Halê wan baş e. Hawayê Urdinê li wan hatiye... Silavên wanji te re jîheye...»
«Bavo û dayê» çûne Urdinê. Piştî çûyina wan, du metên Xezalê hatin mala wan û ew niha li nik Xezalê dimînin heta ku «bavo û dayê» vegerin.
«Ma metên te dê li te nepirsin?»
«Ew çûne serîdana cîranan. Ew her gav li nav malan digerin.»
«Belê, belê, aha feqîrxana min jî weha ye... ev oda rûniştinê ye. Li kêleka vê odê, oda min ya razanê û li kêleka wê jî oda kitêbên min hene. U mitbaxeke hûr..»
Xezalê radibe ser piyan, hêdî hêdî, li der û dorên xwe dinihêre. Ew çi bibêje? «Mala te xweş e, kek Mem-duh.» Dîsan kek! Heyran, çima kek? Kincên tenik û rengîn lê ne. Di nav kincan de beden wekî birca keleha
101

Wanê spehî dixuye.
Çavên wê, niha, h ser lewhên dîwêr in. Çar lewhe. Dudu hinekî li jor yên din in.
«Ma hewce ye ku ez bibêjim, ev lewhe li ber dilê min pir ezîz in?.. Yek keleha Wanê ye. Warê bav û kalên min. Warê ku ez lê xwedî bûm, zarotiya min tê de bi-hurî. Ya din sûr û bircên Stembolê ye. Cîhê ku min xwe tê de nas kir, ez bûm peya, min xwend û dest bi xebatên xwe yên siyasî, civakî û çandî kir... Herçî ev her du lewhên din in, ev kalê rîhspî û rûbinûr Şêx Seî-

dê gorbehîşt e. Berî niha bi sê salan, ew li Diyarbekirê hat bidarvekirin. Ew însanekî ewliya û serek û pêşewayê serîhildana me kurdan ya herî mezin bû. Hezar heyf ku min tu carî keys nedît ku min ew binasiya... Ev sûret jî ya dostê min'ê ezîz, birayê min, dilê min, ruhê min Kemal Fewzî ye. Bi salan em bi hev re bûn. Em, bi hev re, tî û birçî man. Me, bi hev re, her celeb xweşî tahm kirin. Ew jî... ew jî, tevî Şêx Seîd, hat bidarvekirin...»

Bêdengî. Dengê hîsên bêziman. Dengê bedenan. Xezalê, bêdeng, tê nik Memduh Selîm Begê, bi dilovanî h bîbûkên çavên wî dinihêre, her du destên wî dixe nav lepên xwe û wan radimûse.

8

Met li nav malan digerin, Xezalê jî li mala Memduh Selîm Begê. Bi hênceta kitabxwendinê, ew xwe dilezîne mala destgirtiyê xwe. Li mal jî, agirê mankalê hîs û dilê wê germtir dike û ew hîn bêtir nêzîkî li Memduh Selîm Begê dike.

Iroj jî dersa ew dê bixwînin, di derheqê Eugêne Ysaye de ye. Memduh Selîm Beg ji kitêba fransizî dixwîne û jê re, hê dî hêdî, dide zanîn.

102

«Ferîhayê, Ev Eugêne Ysaye ji wan kesan e ku di warê musîkê de şoreş çêkiriye. Ew yek ji niwênerên sedsala me, sedsala reform û şoreşan e. Tarîxa jidayikbûna wî 1858 e. Wî li Bruksel û Parîsê, li Vieux Temps'ê

xwendiye û bi dû re jîkoma Societê des Coucerts Ysa-
ye aniye pê. Ew bû serokê koma kraliyetê ya musîk li
Belçîkayê. Ew bi qasî 7-8 salan li Engilistan û Amerî-
kayê jî ma. Ew niha li Belçîkayê dijî. Tu kes wekî wî,
nikare li kemancê xîne. Musîka wî, hem ji aliyê teknî-
kî û hem jî ji ahyê ritm, harmonî û dengan yekta ye.»
Çavên Xezalê li ser dest, lêv, simbêl û çavên Memduh
Selîm Begê ne. Di nav van çend rojên dawîn de, Xezalê
tiştekî têdigihê; Memduh Selîm Beg hêdî hêdî dipeyi-
ve, ew gotinên xwe pir vekirî, sade û bi rêk û pêk, li
pey hev rêz dike, pir zû bîr bi tiştan dibe, pir zû hay h
rewş û mercên tevlihev dibe û wekî brûskekê, zû tiştan
têdigihê. Çavên wî bi ken in, lê kena li ser çav nikare
derd, keser, endîşe û meraqên ku ji rû dixuyin, veşêre.
Carina bala wî, ji nişkekê ve, ji merivên kêlekê bi dûr
dikeve, ew pê re dere û dikeve nav xem, xeyal, fikir û
gumanan.
Xezalê ji cîhê xwe radibe û tê li ber wî, li ser totikan,
rûdine, destên wî digire û radimûse.
Nêrîna Memduh Selîm Begê. Xezalê. Çavên xweşik,
kena çardehê heyvê, diranên lûlû, lêvên gul li ser bişki-
vî. Heyineke hûrik, tenik, xweşik û ziravik. Destên
Memduh Selîm Begê h ser porê wê ne. Porê wê yê
nerm û germ wekî herîr. Dest hêdî hêdî guliyên por
vedikin. Ronahî li ser por pêl dide. Porekî nedîtî.
Deng tune. Her du jî ditirsin. Ew welê bawer in ku e-
ger ew devê xwe vekin, ev awayê rengîn û bi sihêr dê
winda bibe.

Memduh Selîm Beg bi dest nîşan dide ku ew rabe pê
103

û li dor xwe bizivire. Hêdî hêdî. Li dor xwe. Li dor êgir. Li dor serfirazî û evînê. Li dor Memduh Selîm Begê. Por difire. Por diçirûse. Por û beden Memduh Selîm Begê sermest dike.
Ew jî radibe pê, çend gav ji mankalê bi dûr dikeve, pişta xwe dide dîwarê sar û li kevoka bêbask dinihêre. Agir û por diçirûsin. Dilê Memduh Selîm Begê û por difirin. Porê zêrîn h gor rîtmên musîka bêdengiyê govend girtiye.
Piştî demeke dirêj, Memduh Selîm Beg xwe dilivîne, ber bi wê dere, wê dide sekinandin û bêdeng, ji porê wê avdayeke dirêj dikişîne. Avdayeke dirêj, zer, zêrîn. Ew avda radimûse û paşê jî datfne ser masê û li Xezalê vedigere. Çav. Ramûsanekê. Ramûsaneke din. Çav. Mûjang. Dûvkaniya çav. Serkaniya çav. Çermikên çav. Bîrkok. Birû... Çavê din. Ramûsaneke din. Enî. Por. Rû. Bêvil. Poz. Ramûsan. Her du hinarik. Gep. Guh. Guhîjk, nermika guh. Ramûsan, ramûsan.
Lêv; du libên tiriya Sorê Mîranî... Serlêv.
Dest pihêt bedena wê hembêz dike. Dest li ser bişkovên fîstana wê. Dest bişkov, yek bi yek, vedikin. Dest wê dizivirîne. Pişta wê. Wekî pişta masiyekê. Bîhn, bîhna misk û emberê. Bişkov vedibin. Dest alîkarî lê dikin ku ew fîstên ji xwe bike. Pî radibin. Fîstan hêdî hêdî jê dibe û dikeve erdê. Kirasê tûlîn û şefaf. Di nav

kirasê zelal de bedeneke bedew û gewher. Di nav kirasê de melayika xweşiyê. Dest radihîşin kirasê û wê jîjê dike. Gewda, bedena nerm, spehî û tahzî diricife. Mûyên zerik yên bedenê tîj bûne. Bedena wê diheze, dilerize.
Bedena wê. Wekî behîfekê. Spî, tenik û nerm. Binçeng û berzik. Daristanên veşartî, rengîn, bi sir û
104

sihêr. Memduh Selîm Beg wê û sir û sihêrên bedena wê dinase. Ew nêzîkî h dinya sir û sihêran dike. Ew jî dest û lêvên Mernduh Selîm Begê dinase. Dest porê zer mist dide. Por wekî lehiyeke boş û zêrîn di nav destan de diherike. «Porê zêrîn, bedena zêrîn, keça zêrîn.» Lêvên wê yên sor, stûr û goştîn. Kena li ser bîbûkên çavan, lêv û diranan. Govenda kenê. Govenda kêfxwe-şiyê.
Stûyê wê. Lêvên Memduh Selfm Begê yên germ ber bi stû dibin. Ew wekî kewroşkekê, na, na, wekî xeza-lekê diperpite. Ew ber bi Memduh Selîm Begê dizivire. Ew lêvên xwe dibe bin gewriya wî û wekî bimêje, gew-riya wî radimûse. Şewat. Şewat bi dilê Memduh Selîm Begê dikeve. Niha Memduh Selîm Beg diperpite, di nav pizotên êgir de dişewite, wekî pelekî rengîn yê payizê, li ser pêlên avê ber bi jor dibe, bi firê dikeve û dere û dere û dere...
Ax Xezalê... Ax tu, Xezala ber dilê Memduh Selîm Begê...

9

Memduh Selîm Beg di çola kiraç ya welatê xerîbiyê de ji xwe re daldayekê, siyekê peyda kiriye; siya evînê. Çaxa derd û kul lê leylan didin, germî û qije-qija mese-le û zehmetiyan bi ser wî re tên, ew xwe davêje bin si-ya evînê. Ew dil û ruhê xwe dide bin hûnikahiya siya evînê.

Siya evînê. Warê rehetî, dilxweşî û bextiyariyê. Warê lîstikên xweş û sirrî. Warê dengê dil û bedenan. Di nav çeperên berberî, dijîtî û dijminahiyan de kozika herî metîn.

Memduh Selîm Beg serê xwe datîne bin siya evînê... Xezalê jî serê xwe datîne ser coga wî. Roj li pey hev

105

diherikin. Met li nav malan, Xezalê jî li mala Mernduh Selîm Begê. «Bavo û dayê» dê di nav çend rojan de ve-gerin. «Em binihêrin ka çi dibe, Xwedê mezin e...» Dest li ser por digerin. Peyvên xweş û nerm. Dinyake ji çîrok û dastanan. Bergeheke ji xewnan.

«Tu dizanî, gava min tu dîtî, çi hate bîra min?.. Bi-nevşa Narîn û strana Binevşa Narînê. Ez nizanim çima, lê ew hat bîra min... Hezar heyf... kurdiya min, yanê zimane min'e zikmakî ewçend ne xurt e. Zimane min'ê xwendin û nivisînê tirkî ye. Lê digel vê yekê, ez hê jî bi çend stran û dastanên kurdî dizanim. Dapîra min ew fêrî min kiribûn. Yek ji wan jî 'Binevşa Narîn û Cem-beliyê Hekkarê' bû...»

Mem û Zîn, Siyamend û Xecê, Binevşa Narîn û
Cernbeliyê Hekkarê... Dastanên ku Memduh Selîm Beg
pê dizane. Çend ji dastanên kurdan yên evînî. Dasta-
nên bi nav û deng. Dastanên devê dengbêj û bilûrvanan.
Dastanên evîna merivê kurd, evîna dilsoj û bextreş.
Dastanên dilên pak, lê şikestî, bedenên ciwan û bedew,
lê bêmiraz...
Dastanên carina bi mirad, carina bêmirad, carina me-
sûd û bextiyar, carina jî bi mirin û kuştin.
Peyvên dilsoj yên dastanan...
«Ferîha, hele guhdarî li van peyvên hanê bike.»
«Binevşê ban dikir, digo 'Şivano, serê bi qurbano,
emrê mi bi heyrano, dilê min, dilekî dibê ye çeqeyse
galgal û gotinê te ji min re gotin, xeberê te timam min
efû kirin, min avêtin binê qonderê ye.' Binevşê go 'Şi-
vano, madam tuê li cim Cembeliyê Hekkarê nîvan bû,
tu werî ji min re basa Cembeliyê Hekkarê bike, ji min
re çêtir î ji mal û mulkê dinyê ye, hesretî xirab e, bela
bi min re nerî diyarê rehmetê axê gorê ye; derdê Cem-
behyê Hekkarê li min ketiye, ez ne dimirim û ne dimî-
106

mm
pe ye...»
Memduh Selîm Beg, tiliyên destê rastê di nav porê
Xezalê de, hêdî hêdî dilorîne. Bi kurdî. (Ew dê, paşê,
jê re, bi tirkî, şerh bike.) Ew, hêdîhêdî, daxwazên di-
lên bi evînê şewitî tîne zimên. Ew, hêdî hêdî, bi stranê

re, dere dinya abadîn ya evînên bêhempa.
Xezalê jî, serê wê li ser coga Memduh Selîm Begê, di xew re dere.
10
Teq, tuq; teq, tuq...
«Lê binihêrin, lê binihêrin... ew dîsan dere...»
«Bi kû de, ber bi kû?»
«Wîî li min, ma hûn nizanin? Kulîlkên spî yên darên behîfan û kulîlkên rengîn yên darên henaran bişkovîn. Teyrên terlan xebera bihara hêşîn anîn. Giya, stirîh, zîl û darên bexçê bajêr, dîsan, serî hildan. Hişinahî bi bexçê ket. Tîrêjên tavê guhezîn bexçê. Ma hûn nizanin ku ew ber bi bexçê, ber bi parqê dere?»
«Mala minê... çi peya ye!»
«Peyayê dilnerm û dilovan...»
«Peyayê dilbirîn û dilşewat.»
«Dibêjin, derdên wî pir in.»
«Binihêrin, binihêrin... hûn dibînin, ew çawan bi rê ve dere... Derd û keseran stûyê wî xwar kiriye. Fikir û gumanan perdeke reş kişandiye ber çavên wî.»
«Ferîha reben bi agirê evînê disote.»
«Gula zer, roj bi roj, diçelmise, lê çavên wî vê yekê nabîne.»
«Guhên wî nalînên Ferîha'yê seh nakin.»
«Ev mêrê delal, ev peyayê bejnzirav çima wê mahr nake?»
107

«Em jî pê nizanin, diya min, em jî. Xwezî me biza-
nibûya!»
«Ev merê rûken û porşehkirî li benda çi ye? Ew çi
dipê?»
«Ma ew nabihîse ku mêr bi navê Ferîha'yê dikevin
xew? Ma ew nabîne ku lêvên simbêltijî bi navê wê
dilivin?»
«Gelo ew nabîne ku deriyê mala bavê Ferîha'yê nayê
girtin? Mêvanekê dere û mêvaneke nû tê. Xelk tên û wê
dixwazin.»
«Lê, lê Ferîha'yê, bedewê, stûna mala bavê xwe, ma-
la çerkezanê.
Lê, lê xwişkê, zarşêrînê, pordirêjê, ezîza ber dilê
Memduh Selîm Begê...»
«Lê binihêrin, heyran lê binihêrin, çawan ew bi ûsil û
bi edeb dimeşe...»
«Belê diya min, belê... ew xweş dimeşe. Lê ez'ê çi
bikim bi meşa vala?..»
«Şeytan pê dilîze, diya min, şeytan...»
«Hele lê binihêrin, hele Xwedê dihebînî lê binhêrin.»
Teq, tuq; teq, tuq...
Wekî dengê saeteke dîwêr. Ewçend xweş, ewçend bi
rêk û pêk. Tav hawirdor vedigire. Dinya û tebîet vedije.
Jin û keç, li pey derî û penceran, li Memduh Selîm Be-
gê dinihêrin û dipeyivin. Wî jî tava germ daye ber xwe,
dimeşe û kolanên Antaqiyayê dihejîne.
11
Du pismam. Du dost û heval. Du hogirên qederê. Du

peyayên rûgulover, simbêlbadayî. U siûdeke wekhev; zaroktiyeke di nav şîr û şekir de, qesr û koşkên bajarê qedîm Diyarbekirê, malbateke stûr û xwedantov, dewlemediyeke bêpîvan, tovên kurdayetiyê. Li xwe vege-
108

rîn. Xwenasfn. Heysiyet û şerefa kurdbûnê, pesna welatê Kurdistanê.
Xortî û Stembol. Dîsan her du bi hev re. Salên xwendinê. Fakulta Zîr'atê. Qahwexanên kurdan. Kombûn û civîn. Komela Xwendevanên Kurd HEVI. Her du bi hev re. Çend kurdên din û Memduh Selîm Beg. «Em di babilîska milletperweriyê de dijîn. Iro her kes li xwe vedigere û dil dike ku ji dewleta Osmanî veqete û dewleta xwe ya mîllf bîne pê... Çima em dê jî weha nefikirin? Ma kevir û kûçên Xwedê li ser serê me barîne? Em jî divê wekî xelkên din bifikirin.»
1913. Ber bi Awrûpayê rêwîtf. Lozan. Avenue Lumen de Pansion Solieye. Dîsan her du bi hev re. Xwendin. Fikir û bîr û baweriyên ewrûpî. Hînbûn. Şarezayî. Di welatê rojava de du kurd. «Hûn kî ne, çi ne? We çi ziman heye? We çi stran, dastan, kinc, edet, xwarin û vexwarin hene?..»
Pirsiyarên ewrûpayiyan.
Şerê cîhanê. Rojên xwînî. Çelqîna dinyê. Dinya di hêlekana xwînê de. Stembol. Dîsan her du bi hev re. Di refên ordiya Osmaniyan de şerkirin. «Piştî vî herbê dê bûyerên pir girîng yên siyasî werin pê. Me kurdan hazi-

rî divê...»
Heyhat...
1923, damezrandina Komara Turkiyê. 1925, serîhil-
dana kurdan. Pêşewa Şêx Seîdê Pfranî. Biserneketin,
şikestin. Yan jî biserketina tirkan. Girtîxana Diyarbe-
kirê. Dîsan her du pismam bi hev re. U rêberên kurdan.
Siya sêdaran. Nefesa Ruhistîn li ser stû. Loriya zaro-
kan. Hawara jinan.
Mixabin...
Bidarvebûna pêşewayên kurdan. Şêx Seîdê kal û rîh-
spî û hevalên wî. Yek bi yek.
109

Para pismaman; ji bin sêdarê, bi şûn de, ber bi girtîxa-
nê vegerîn. Ceza. Salên ku li zîndanan buhirin.
U niha jî binê xetê, yanê Sûriye. Dîsan her du bi hev
re.
Du jiyan û siûdeke wekhev. Di nav çend rêzan de sa-
lixdana siûdeke kerserkûr û malkambax. Ew, du pis-
mam; Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa... Wan, bi hev re, pişta
xwe dan agir û tofanê û berê xwe dan bawerî û hêviyê.
Ew hatin Sûriyê.
Destpêka Nîsanê, 1929. Antaqiye. Mala Memduh Se-
lîm Begê. Ew û du pismam. Ew hatine serîdana Mem-
duh Selîm Begê.
Hevalên kevn, hevaltiyeke germ.
«Ax mîrên min, ax... Ev bûn çend sal, ev bûn çend
sal ku me hevûdu nediye? Hûn bi xêr û xweşîhatin...

bi xêr û xweşî.»
Ew dikenin. Jixwe, Qedrî Beg, her gav, bi dengekî bilind dikene, henek dike. Ew di tiştê herî cîddî de jî şopên henek û kenê hiltîne. Ew tiştên balkêş bi zimanekî xweşik û kêftijî tîne zimên û hawayekî tenik yê kêfxweşiyê direşîne ser civêt. Merivekî niktezan û niktebêj.
Memduh Selîm Begê carina pirûz û carina jîrûbiken, li Stembolê, dil dikir ku wî jî wekî Qedrî Begê bikaribûya henek bikirina, niktan li pey hev rêz bikirina... Lê mixabin, ew nizane xweş bike. Ew nizane, bi alîkariya henek û qirfan, mij û dûmanên endîşe, xem û keseran ji xwe bi dûr xîne, ew awayê malkambax yê cîddîyetê, bi henek, dîlan û stranan, bixeniqîne...
Carina Memduh Selîm Beg dil dike, pir dil dike ku ew bibe qeşrnerekî rengîn û fetbaz û şênî lê bicivin û wan bide kenandin.
Qedrî Beg, mîrê min... tu qet neguheriye. Ken dîsan
110

h ser rû û çavên te ye. Tu dîsan kêf û henek diçinî dora xwe.»
«Na birayê hêja, na. Pir tişt qewimîn., pir tişt hatin serê me. Aha ev du însan, xwediyên van lewheyên ku li ser dîwarê te ne, însanên qedirgiran Şêx Seîd û Kemal Fewzî û hevalên din li ber çavên me hatin bidarvekirin... Hukimeta tirkan agir berda welêt. Memduh Beg, welat dişewite û em jî pê re...»

«Hele bîhna xwe bigirin, westa xwe bigirin, mîrên min. Em dê, hêdî hêdî, van tiştan, digel her kit-kitê, bi-peyivin.»
12
«Memduh Beg, ew rojên eskerî yên Erzurimê tên bî-ra te? Tu bibûyî zabîtekî jêhatî. Lê pantol û qapûtê te yên zivistanê ewçend stûr bûn ku tu di nav de winda dibûyî. Ew ji erdê re diçûn...»
Rojên şerên cîhanê yê dijwar. Di eniya Rohhelat ya Osmaniyan de li dijî ordiya Qeysarê Rûs şerkirin. Du seresker; Memduh Selîm û Qedrî Cemîlpaşa. Sar, serma û pûka Erzurimê. Bereqe û konên eskerî.
«Memduh Beg, ew şeva ku me di di qerergehê de votka rûsî vexwar... Naxwe tê bîra te?.. Me ew votka delal, bi dizî, ji dijminên xwe, ji eskerên rûsan kirîbû. Cewdikên me tijî votka bûn. Wekî niha tê bîra min, bi temamî deh cewdik tijî votka bûn. Di dewsa avê de, cewdik bi votkayê tijî bûbûn. Heta destê sibê, me vot-ka bi ser serê xwe re kir û me zik li xwe kirin def. Me ewçend vexwar ku em ji xwe bihurîn... Baş e, paşê me çi kir, heee... Memduh Beg, me çi kir?»
Haaa, hooo, haaa, hooo... Işev best li Memduh Selîm Begê rabûye. Kena wî -dîsan- bêpîvan e. Ew ji kena, nikare bipeyive.
111

«Tu dizanî birayê Ekrem, paşê jî ez û Memduh Beg, bi hev re, çûn mitbaxa qerergahê. Bi dizî. Me hinekî

xwarin diviya. Memduh Beg, îcar ne bi tenê pantol û qapûtê te, tu bi xwe jî ji erdê re diçûyî... Axir, em bi hezar zehmetî gihîştin mitbaxê. Lê me nizanibû ka xwarin li kû ne. Nobedarên mitbaxê jî nedixuyan. Kê dizanibû wan li kû vedixwarin! Memduh Beg, te bawer dikir ku di dolabên herî jor yên mitbaxê de xwarin, fekî û sebize hebûn. Bejna me nedigihfşt dolaban. Ez nizanim te ji kû dît, lê ji nişkekê ve, te nêrdîwanekê peyda kir, te ew danî ber dîwêr û hilkişiyayî ser da ku xwe bigihînî dolaban. Heta pêpinga paşîn her tişt baş bû. Tu wekî pilingekî hilkişiyayî ser nêrdîwanê. Lê çi bû, di pêpinga paşfn de bû... koşeke qapûtê te ket bin lingê te û tu şemitî û li xwe qelibiyî... U şinginî û reqîn bi firaqan û mitbaxê ket...»

Hahaha, hohoho...

Memduh Selîm Beg û du pismam. Ew li mala Memduh Selîm Begê rûniştine û di bin ronahiya qels ya çirê de qesta felegê û rojên kevn dikin. Memduh Selîm Beg bi destên xwe sofre bi dar xistiye. Eynî wekî sifreyên wan yên kevn yên rojên Stembolê. Tevî xwarinên têvel, araqa spî, cacix, selete, sebze, fekî, tebûleyê Antaqiyayê. U dûmana cixarê. U ken û henek. U germiya hevaltiyeke qenc, metîn û dilovan.

«Mîrên min, me bihîstibû ku we dil hebû, hûn dakevin bin xetê. Di çend rojên pêşîn yên meha yekemîn ya îsal de, ez li Helebê, li nik hevalan bûm. We bi navê Rifat efendî zilamekî şandibû. Min ew li Helebê dît. Wî behsa we kir..,»

«Em bêgav man, Memduh Beg... Me hew îmkan hebû ku em bimana. Em dê bihatina kuştin... Hukimeta
112

Turkiyê, pir bi zanîn, rê nade ku munewerên kurdan di nav xelkê xwe de bijîn. Ew muneweran dikujin, yan jî ji welêt bi dûr dixînin. Ew welat dikin kavil û wêran.»
«Lê belê, mîrên min... hê jîher tişt xelas nebûye. Çi-rûska hêvî, serîhildan û biserketinê, ji nû ve, hatiye pê-xistin. Li gor xeberên ku ji me re tên, xelk hêvî bi Xoy-bûnê û serîhildana çiyayê Agiriyê heye...»
«Ax birayê hêja ax, jixwe em jf ji bo vê yekê hatin Sûriyê. Me şer divê, Memduh Beg, me çekhilgirtin û li-berxwedan divê...Agirî, yanê hêvî divê hilneweşe...»
13
Stembol. Memduh Selîm Beg û Xezalê. Ew kincên ku hevalên wî dabûn, li ser wan. Piyê Xezalê yê rastê di nav piyê Memduh Selîm Begê yê çepê de. Porê şehkirî yê Memduh Selîm Begê dibiriqe. Zîncîra zîvîn ya saeta wî ya zîvîn ji bêrîka êlegê dixuye. Xezalê, çavên kîlkirî dibiriqin. Porê rengîn li ser stû pêl dide. Mesûd û kêf-xweş.
Stembol. Ew vegeriyane Stembolê. Welatê xerîbiyê li pey wan maye. Her du evîndar di piyên hevûdu de, h bajêr digerin.
«Guh bidêrin niqtê aşiqan
Da ez bixwînim vê xetê
Hemd û senaya Xaliqê

Sibhan ji Şahê Qudretê»
«Ferîha, ev rêz yên Feqehê Teyran in. Gava mezinên me dest bi tiştên xweş dikirin rêzên weha dixwendin..»
Ji kêfa wan re payan tune. Li Stembolê ger û meş... Ma kê bawer dikir ku ew dê bikaribûna vegeriyana?.. Ji erdê bîhna biharê radibe. Bahara Stembolê. Vegera bihuştê. Hilavêtina dilên evîndaran. Vebûna deriyê di-lan. U vebûna deriyên kevnare yên avahî, keleh û bir-

cên Stembolê.
Memduh Selîm Beg, niha, qewlekî xwe yê kevn bi cîh tîne. Ew deriyên kevnare yên Stembolê, yek bi yek, nîşanî Xezalê dide.
«Deriyên sûr û bircên Stembolê pir in. Tu dizanî, sê aliyên Stembolê av e. Di van aliyan de derîne zêde ne. Xwediyên Konstantinopolîsê, yanê Stembolê, hewce nedîtine van ahyan bi derî bineqişînin. Lê aliyê bejiyê ne weha ye. Ji vî aliyê re derî û sûrên metîn diviyan da ku bajêr bikaribûya xwe biparasta... Di çaxa Bîzansi-yan de derî, her gav vekirî nebûn. Evarê derî dihatin girtin. U meriv bi çire û qandîlan li bajêr digeriyan... Galata, warê min jî, jixwe, bi sûran dorgirtî, bi serê xwe bajarekî biçûk bû... Axir, li gor ku ez ji kitêban hîn bûme, deriyên Stembolê di navbera 40 û 45 an de ne.»
Tarîx. Deriyên tarîxî. Stembola do, Stembola kevna-re. Memduh Selîm Beg û Xezalê. Kevirên spî, stûnên

reş. Neqşên têkel. Tîpên romiya kevn; şahîdên tarîxe-
ke xwînrêj.
«Kek Memduh, te bawer dikir ku em dê weha
li van deran bigeriyana?..»
Kê bawer dikir?
Deriyê Silîvrî. Deriyê herî xweş û şêrîn. Deriyê der-
ve û hundir. Tê de avahiyeke xweş û biçûk. Neqş, sûret
û tîp. Pi tîpên romiya kevn «Peges.» Yanê navê derî, bi
bîzansî. Yanê bi bîzansî masî. Li nik derî dêreke kevn
û goristaneke hêşîn. Tê de gorên patrîkên bîzansî.
«Ez ji vî cîhê hez dikim, pir caran hatime vê derê.
Gava bîhn li min diçikiya, derd li min dihatin xezebê,
hingê min xwe davêt vê derê û di goristanê de digeri-
yam. Ez nizanim çima, lê ez ji goristan û bêdengiya
wan hez dikim... Çîrokeke vê derê jî heye; di wan roj-
114

ên ku tirkan êrîş anîne ser Konstantînopolîsê de,
keşîşekî li vêderê, li ser êgir, masî sotandine. Gava
keşîş bihîstiye ku tirkan bajar vegirtiye, masî vejiyane
û xwe avêtine nav avê. Bîzansî û romiyên kevn dibêjin
masiyan ji qahran welê kirine û tirk jî dibêjin ji kêfan.»
Xêreke din ya kitêban; Memduh Selîm Beg bû şahî-
dekî yekta yê tarîx û guherînên tarîxê û wî tûrika xwe
ya zanînê bi çîrokên weha tijî kir.
Piyê Xezalê di piyê wî de û serê wê jî li ser milê wî.
Tevî serê wê, du kevokên spî wekî berfê jî hatine û li
ser her du milên wî veniştine. Ew, hêdîhêdî, dimeşin.

Giyayên hêşîn yên ber hngên wan rê didin wan. Tava germ, giyayê hêşîn, derî û goristanên kevnare, azadî û serbestî, Xezalê û kevokên evînê.
Xewnek ji xewnan.
Lê belê... ji nişkekê ve ji koşeyên goristanê polîs û eskerên tirk dixuyin. Bazên xwînî, dijminên kevokan. Şeytanên devbigirêz. Di destên wan de demançe û tifing. «Na, na, weha nabe!..» Ew ber bi Memduh Selîm Begê û Xezalê tên. Dest, pî û dev dilezin.
«Nihayet seni yakaladik!..»
Yanê, di dawiya dawîn de me tu girtî!..
Dinya li ber Memduh Selîm Begê reş dibe. Tav dibe hûtekî xwînxwar. Giya dibin marê reş û kor. Qebrên goristanê dibin hirçên reş. Deriyê spehî dibe teyrê terlan. Ji avahiya hundir jî şêr diorin. Her tişt li wan tê xezebê. Her tişt bi ser wan re tê.
«Ferîha zû, Ferîha baz de!»
Ew direvin. Li pey wan erîn, gurîn, feşîn, gujîn, hîrîn, kufîn, kûrîn, qîjîn, qîrîn... û wîzîna berik û gulan. Ji nişkekê ve Xezalê radiweste. Xezalê dukile. Xezalê hildiweşe û dikeve erdê. «Na, na,..»
Na...na...na...
115

Memduh Selîm Beg vediciniqe. Ew, bi qîrîn, hişyar dibe. Oda tarî. Textê wî yê fireh. Kirasê wî yê şevê lê. Şil. Anteqiye. Ne Stembol. Mala wî. Ne deriyê Silîvrî. Yanê dîsan xewn. Xewneke ji xewnên şevên tenê yên

bajarê biçûk.
Xewneke ji xewnên malkambax.
14
Civîn. Li Helebê. Di odeke stûr ya Hotel Central de. Serokatiya Xoybûnê. Celadet Bedirxan, Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa, Memduh Selîm û yên din... Rojên giran. Rojên ji bûyerên nû re avis. Rojên biryarên nû, gavên nû.
Biserketin û biserneketin. Serfirazî û têkçûn. Zafer û şikestin. Dîlan û nalîn. Bihuşt û dûjen. Du aliyên rûpe-la qederê... Kîjan aî?
U ji bo aliyê dîlan, govend û stranan çi divên?
Rojeva civînê; Agirî. Rojeva welatê Kurdistan û me-rivên kurd; şoreşa li ser çiyayê Agirî. Rojeva hilavêtina dilan; çirûskên hêviyê yên Agirî. Yanê rojeva biryarda-na li ser aliyekîji aliyên rûpela qederê; Agirî.
«Ev bûn çar sal ku alaya azadiya kurdan li spêdên A-giriyê hildibe... Şerwanên kurd xwe li dora Agiriyê di-girin. Navçeyên Erzurim, Beyazid, Wan, Mûş û Bêdlîsê bi dengê şoreşê hesiyane...»
Hilbûna alaya kurdan, şerwanên kurd, pêşveçûna şo-reşê... lê belê, li milê din jî bêgavî û neçariyên mezin. Nebûna îmkanên aborî. «Carina di bêrîka me de pere tune ku em pê ji Helebê herin Beyrûdê.» Zext û zorên fransizan. «Bernadin bavo, fransiz bernadin, em gav ba-vêjin. Em diçin kû, ew li pey me ne, tên h me dipirsin, rê li me digirin.» Dîplomasiya dewleta Turkiyê û pey-wendiyên wê bi dewletên Iran, Yekitiya Sowyetî û

Fransê re.
«Em dê niha çi bikin, çi divên?»
Hevalên Memduh Selîm Begê. Ewana, jiyana wan û welat. Jiyan û welat bi hev re bûne yek. Her tişt ji bo welat. Her celeb daxwaz winda bûye. Bi tenê welat, daxwaza welêt. Di welatê xerîbiyê de, ew bi agirê welêt disotin. Wekî din tu rê jî li ber wan nemaye. Ew divê di riya ku wan daye ber xwe de, her bimeşin. Digel her celeb zehmetî û neçariyê...
«Begên min, em divê, berî her tiştî, li ser hin tiştan biryar bigirin... Mesela yekemîn Yaşar Xanim e. Jina Ihsan Nûrî. Ew niha li vir, li Helebê ye. Hûn dizanin, ew li Turkiyê, di destê tirkan de bû. Lê piştî ku Ihsan Nûrî zor da wan, ew jî bêgav man ku Yaşar Xanimê berdin. Em divê wê, niha, bişînin nik mêrê wê, yanê bişînin Agiriyê.
Mesela duwemîn jî cîhê Partiyê ye. Hevalno, Beyrûd dûr e. Yanê ji welêt dûr e. Cîh û serokatiya Partiyê divê nêzîkê welêt be... Qedrî û Ekrem Beg hatine û li Hesiçeyê bi cîh bûne. Hesiçe li ser tixûb e. Ma ne çêtir e ku em serokatiya Partiyê jî bibin Hesiçê?
Mesela sêyemîn xire-cira fransizan e. Ew dil nakin ku em weha her gav werin Helebê. Gilî li me dibin. Eger weha bi serbestî, em herin û werin, ew dê rê li me bigirin. Em divê jê re çareyekê bibînin.
U meseleyeke din jî ev e ku Ihsan Nûrî Paşa dawe li

me kiriye ku em ji serokatiyê hevalekî bişînin Agiriyê. Ji bo kar û barên siyasî. Welê dixuye ku ew, bêtir, bi karên eskerî û rêkxistinî bilî dibe û wan, wî û hevalên wî wext tune ku karên siyasî, bi awakî xweş, bimeşî-nin. Em divê ji nav xwe hevalekî bişînin nik serokatiya tevgerê...»
Agirî û Ihsan Nûrî... Her du bi hev re, gav bi gav, nê-
117

zîkî li Memduh Selîm Begê, jiyan û siûda wî dikin. Wî şoreşeke weha dil dikir û ji bo şoreşeke weha dixebitî. Lê şoreş û çirûskên şoreşê jê bi dûr bûn. Niha, germiya çirûskên şoreşê xwe digihînin wî jî. Şoreşa ku li dûr bû, niha, her ku dere, nêzîkî li wî jî dike.
Hevalên wî h ser meselan dipeyivin. Ew jî difikire. Li ser siûda xwe û siûda welatê xwe. Eger ew ne kurd bû-ya, siûda wî dê, dîsan, weha bûya? Siûda fransizekî, e-rebekî, tirkekî, îngilizekî çawan e? Ferq di navbera si-ûda kurdekî û siûda merivekî din de çi ne? U tiştê herî girîng, ew dil dike ku bibe xwediyê siûda fransizekî?
«Memduh Beg, tu çi dibêjî?»
«Çi?»
«Bila kîji me here Agiriyê, îmkanên kê hene?»
«Mîrên min, hûn li ser biryar bidin. Ya muhîm, çû-yina hevalekî ye. Bila hevalekî, heta eger hewce be, çend heval herin. Eger kesekî din nikaribe, ez bi kêf-xweşî derim... Em divê daxwazên şerwanên Agiriyê bi cîh bînin. Ew h wê derê şer dikin. Eger mirin jî h ser rê

be, em dîsan, divê piştgirtî h wan bikin...»
Agirî; navenda jiyanê, daxwazên dilsoz, best, siûd û mirin.
15
Piştî rêwîtî û civîna Helebê, dîsan Antaqiye. Şeveke vekirî ya Antaqiyayê. Kolanên vala, kahwexanên tijî. Li ser kolanan teq û reqa hesp û faytonan.
Memduh Selîm Begê westiyayî li ser rê ye. Ber bi mala xwe. Bîhntengî. Bîhntengiyeke bêtarîf. Macîrî, xerîbî, bêgavî, bêkesî, bêhêzî, neçarî, jiyana tevlihev, nezanî û belengaziya xelkê kurd, jihevketin, kirdeyên tirkan û di ser de jî rênedan û zehmetiyên fransizan. «Ev halê me'ê çi bibe?»
118

Mala Memduh Selîm Begê û mala «xwezûranên» wî. Çend tax ji hevûdu bi dûr. Sibê, piştî kar, ew divê here mala wan. Ev bûn çend roj ku wan hevûdu nedîtine. Dostê wî, monsieur simbêl, jî êdî kal dibe. Ew jî bêhêvî ketiye. Çerkezan jî dixwestin tiştine li dijî Mustafa Kemal û rejîma nû ya Turkiyê bikirina. Lê nebû. Bêgavî, neçarî, bêpiştî û bêîmkanî ew ji hev xistin. Her bi awakî peregende, belav bû û çû derekî. Dostê Memduh Selîm Begê jî, niha, bi hêviya vegera Turkiyê dijî. Xezalê? Ma ew bi hêviya çi dijî?
«Tu hê pê nizanî ka ew bi hêviya çi dijî?»
Memduh Selîm Beg kilîta destê xwe, bi hêdîka, dixe mifta derî û deriyê mala xwe vedike. Mala bêkes û bê-

jin... Lê, li aliyê hundir, li erdê, li nik derî zerfekî spî. Nameyekê. Li ser zerfê, bi tirkî, lê bi tîpên erebî «Memduh Selîm Beye...» Yanê, ji Memduh Selîm Begê re... Li ser zarfê tu pûl naxuyin. Welê dixuye ku xwediyê (yan jî xwediyên) namê ew bi destan avêtine hundir.

Ew derbasî oda hundir dibe, namê datîne ser masê û çira gazê vêdixe, misteke ronahî direşîne ser kirasê şevê. Çira di destan de, ew dere oda razanê û xwe li ser textê xwe dirêj dike. Mista ronahiyê jî li ser sandûqa nik textê wî ye. West wî dîl digire. Perda xewê bi ser wî re tê û çavên wî tên girtin.

Li Antaqiyê jî ew bi tenê ye. Ji monsieur simbêl pê ve tu kes tune ku ew bikaribe jê re dilê xwe veke. Nasên wî yên kurd, tirk, ermen û fransiz hene, lê dan û standinên wan bi mesafe ne. Jixwe ew ne merivekî welê ye ku bikaribe, bi carekê, peywendiyên germ bi me rivên dora xwe re bîne pê. Jê re wext, best û daxwaz divê.

Bi dû demeke dirêj, çend saetan re, çavên wî vedibin.

119

Xeweke şêrîn ya çend saetan. Şeva tarî û mista ronahiyê. Mala sar. Bi tenê. Bîhntengî. Birçî.

Mitbaxa wêran. Li ser masê çend firaqên neşuştî, du xwelîdankên tijî, şûşeyeke vala, qedeheke nîvraqîtijî. Li koşeyeke mitbaxê çend şûşeyên din. Vala. Li ser dîwaran çend ref û tê de, bi awakî peregende, firaqine. Li

koşeyekê du dolab, li nik hev. Li her alî toz. Mitbaxe-
ke bêdûzan û gemarî.
Çend lib zeytûn. Du serî penêr û pariyeke nan. U av
li ser tifika gazê, ji bo çay. «Hele ez tiştekî têxim ber
dilê xwe, paşê Xwedê kerîm e...»
Name... Ew ji hundir, ji oda rûniştinê namê tîne û bi
hêdîka wê vedike. Bfhneke xweş. Bîhna wê! Kaxizeke
spî û li serê çend rêz. Bi tirkî. Bi tîpên erebî. Destnivî-
sa wê! «Te çi dil heye, Xezala ber dilê min?» Destpêka
namê, wekî her carî, «Memduh abi...» Yanê kek Mem-
duh. Di nama taybetî û şexsî de jf kek Memduh. Piştî
nasîna bedenan jî, dîsan, kek Memduh. Çima?
«Li min bibihure ku ez weha vê namê dinivîsim û
wekî dizekî, têm û di bin deriyê te re davêjim hundir...
Lê belê, herwekî tu jî dibînî, me zêde wext nabe ku
em bi tenê bimînin û bi hev re bipeyivin. Ez dil dikim,
pir û pir dil dikim ku bi te re rûnim û bi saetan, bi ro-
jan bipeyivim. Lê nabe...
Sevgili abîm,
Tiştê ku min eciz dike û ji ber vê yekê jî ez te eciz
dikim, ev e; pir kes tên mala me û min dixwazin... U
kesên tên pir dipeyivin û pir tişt dibêjin. Ez pir pê diê-
şim... Bavo zêde guh nade hatin û çûyina xelkê. Lê da-
yê ne welê ye. Ew li gotinan guhdarî dike... na, ez ça-
wan bibêjim?.. Ew li gotinan guhdarî nake, lê gotin te-
sîr lê dikin... Huzûra malê reviyaye û ez xwe di vê yekê
de mesûl dibînim. Wekî ku ez bûme barekî giran li ser

milê wan. Ez çawan bikim? Tu çi difikirî?
Careke din li min bibihure ku ez te eciz dikim.
Tu di xêr û xweşiyê de bimînî...»
U di bin rêzê namê de jî navê wê; Ferîha. Bi tenê Ferîha. Ne kêm, ne zêde. Li ser kaxizê spî rêzine dilsoj û hawartijî.
«Tu çi difikirî?..»
Memduh Selîm Beg çi difikire? Nan û penêr di destan de, li pê rawestiye û difikire da ku bizanibe ka ew çi difikire. Tiştên ku ew lê difikire, pir in. Yan jîji bervajiyê, ne tu tişt in. Hem pir tişt, hem jî ne tu tişt. Lê tiştekî aşkere heye; wî heq tune ku ew xirabî li kesekî din bike. Wî heq tune ku ew Xezala dilpak eciz bike, dinya wê reş bike. Na, nabe.
Name. Nan, penêr û zeytûn. Şeva reş û misteke ronî. Careke din namê xwendin. Bîhntengî. Careke din.
«Sevgili abim,,.» Dengê hawarê. Daxwaza alîkariyê.
«Tu çi difikirî?»
«Eger hatin û çûyin û gilî û gotin nedabûya dilê wê, wê ev name nedinivisf... na, na nedinivisî.»
Çaya germ. Hêdî hêdî. Nan û penêr. Pirûz, bêkêf, pojandî, xemxwar, xulqteng.
Ew deriyê dolabeke mitbaxê vedike û jê şûşûyeke tijî derdixe... Belê, biryar divê. Weha nabe. Biryar, rêkûpêkî û xweragirtin divê. Bîhntengf nefes lê diçikîne. Ew divê bi hinekan re bipeyive, bi hinekan bişêwire, sohbet bike. Lê kî? Bi kê re?

Şûşa araqê. Qedeh. Hinekî av. Rengguherîna araqê.
Rengê berfê; spî... Di şeva sar ya Antaqiyayê de Mem-
duh Selîm Begê bîhnteng biryar dide ku jê re, ji jiyana
wî re biryar divên.
Biryarên ku pêşeroja wî ronî bike.
Belê,biryar...
121

16
Icar jî dora Memduh Selîm Begê ye. Icar jî ew hevalê
xwe yê çerkez diezimîne. Li Meyxanê. Di nav tişt û
bergehên ermenî de. Bi qesta rindî û xweşiyê. Bi kêf-
xweşî.
Tu guherînên nû naxuyin. Meyxane her wekî xwe
ye; maseyên tijî, xeberdan û pîqe pîq, dûmana cixare,
qelûn û nêrgilê û bilûrvan û dengê bilûra wî. Li koşê,
maseyeke biçûk û li her du aliyên masê Memduh Selîm
Beg û dostê wî. Xwarin h ser masê. Bê guman araq jî.
Xwediyê meyxanê, dostê Memduh Selîm Begê yê er-
men, bi destê xwe xwarinên wan hazir kiriye. Bi kêf-
xweşî û best. U li gor kitêba xwarinên ermenan ; Miftah
-i Tabbahim. Yanê Mifta Çêştkeran.
«Mîrê min, xwarinên dostê min Kevork bi nav û deng
in. Lê ew bi xwe, zû bi zû, li meyxanê xwarin çênake.
Heta tiştekî taybetî nebe, ew ranahîje firaqên mitbaxê.
Berî çend rojan min jê rîca kir ku ew ji bo îşev xwari-
nin çêke. Wî kerem kir ev xwarinên ser masê hazir kir.
Mesela ev meze, xwarineke navdar ya ermenan e. Navê

wê topik e. Ew ji nok çêdibe û jê re hostetî û wext divê. Bi kêmanî sê roj...»
Ji wê şeva ku Memduh Selîm Beg name dît, ew xwend û biryar da ku jê re biryar divên û pê ve, ew xwe çêtir hîs dike. Ew dipeyive, henekî dike, dikene, dixwe û vedixwe. Bi kêf û xweşî. Ji wê şevê û vir ve ye, wî hin biryarên din jî girtin; ew dê erebiya xwe çêtir bike û h serê bixebite, ew dê bi qasî 20 kitêbên fransizî ji Lubnanê bide anîn û ji du kovarên fransewî re bibe abone, ew dê hinekî pere deyn bike û ji xwişka xwe re bişîne, ew dê ji malê re du xalîçeyên erzan bikire, ew dê bûyerên piştî 1923 an wekî notên biçûk binivîse... û her weha...
122

«Mîrê min, ma wext nehat ku em daweta xwe bi dar xînin?..»
«Memduh Beg! Malava, ma tu ji min dipirsî? Em hemû li hêviya te ne.Tu divê biryar bidî.»
Kêfxweşiya li ser rûyê monsieur simbêl. Rehetî. Vebûna deriyeke xêrê. Bersîva pirs û gumanan. U bersîva stûna malê.
«Memduh Beg, tu nizanî, ez li malê, ji destê maliya me çi dikişînim. Ew dê jî niha rehet bike û pise pisa xwe bibire... Memduh Beg, daweta me divê welê be ku devê dost û dijminan vekirî bimîne...»
Belê, daweteke germ, stûr, abadfn. Pir meriv. Bi şev û roj musîk. Xwarin û vexwarin. Dîlan û govend. «Bila

dengê defê bigihê tixûbê Turkiyê.» Daweteke h gor e-
detên kurd û çerkezan. Kincên neteweyî, şûr û xençe-
rên zêrhêlî yên çerkezan, govend û stranên kurdan. Bi-
ratî û dostiya du xelkên bindest û belengaz. Daweteke
welê ku kesên ku bi salan hevûdu nedîtine, bi hev re
nepeyivîne, werin nik hev û bi hev re govend bigirin.
Lê...
Daxwaz û hîsên Memduh Selîm Begê; bêkesî û neça-
riya welatê xerîbiyê, bindestiya welêt, zordestiya tir-
kan... «Mîrê min, helbet tu çêtir dizanî, lê min dil tune
ku em dîlaneke wisan mezin bi dar xînin. Em merivên
feqîr û belengaz in. Me ne îmkan û ne jî pere hene. U
me şîn girêdaye, welatê me di nav êgir de dişewite, em
tên kuştin, xelk xwîn digirî... Ez nizanim, lê di heya-
meke weha de, ez bawer im, daweteke sade û bêdeng
çêtir e. Lê dîsan hûn dizanin... Hûn çawan bixwazin,
em'ê welê bikin...»
«Em h ser bifîkirin, Memduh Beg. Ez vê xebera pîroz
bigihînim maliyê û Ferîha'yê jî. Em binihêrin ka ew çi
dibêjin.»
123

Sade, bêdeng, ji teq û reqê bi dûr, ziravî... Çend ali-
yên Memduh Selîm Begê nefsbiçûk. U bê guman, evîn.
Ew rojên zarotiyê, ew rojên evîntijî yên Wanê, qiraxa
gola Wanê. Ew û xwişka xwe. Evîn... Evîna vebûna ku-
lîlkên behîfan. Kulîlkên spî û xweş. Mêşhingiv. Ew û
xwişka xwe. Ew li ber kewarên mêşhingivan disekinin

û li wan dinihêrin. Bi saetan. Di biharan de hechecik tên. Ew û xwişka xwe li hêlînên wan dinihêrin. Bi saetan. Ew ji hechecik û hêlînên wan hez dikin... Bi best û evîneke zelal û sade.
«Bila sade be mîrê min...Tu bi Ferîha û diya wê re bipeyive.»
«Baş e, Memduh Beg, em daweta xwe kengê bi dar xînin?..»
Kengê? Pirsiyareke girîng. Gaveke nû. Bi dû biryara dawetê re, biryareke nû. Dawiya biryaran nayê. Bi dû biryarekê re, yeka nû tê. Biryar li pey hev dizên.
«Ez nizanim kengê. Lê bi tenê, min dil bi tiştekî he-ye; ez dixwazim, bav, xwişk û xalê min jîwerin dawe-tê. Hatina xalê min ne mesele ye. Ew li Şamê dijî, ken-gê be, ew dikare were. Lê ji bo bav û xwişka min ew-çend ne hêsan e. Ez divê ji wan re binivîsim û ji wan bipirsim ka ew dikarin werin û kengê. Ez dê, hema, ji wan re binivîsim û xebera dawetê biguhezînim wan. Ew dê pê pir kêfxweş bibin...»
Şeveke bi ken û kêfxweşî. Digel xwarin, vexwarin û musîka ermenan, xeber û biryarên xweş.
«Memduh Beg, ji bo xebera pîroz...noş... Işev, te ez şad û mesûd kirim.. Xwedê ji te razî be.»
17
Piştî xeber û biryara pîroz, xebereke nû; «Memduh Beg, Agirî di nav agir de ye, were Helebê. Silav.» Tel-
124

grafeke biçûk. Ji hevalên wî.
Piştî teîgrafeke weha çi divê? Bê guman, rêwîtî. Ber bi Heleba kevn, bajarê tarîxî.
Ew, niha, li Helebê, li nik hevalên xwe rûniştiye û bi destmalê bîvila xwe paqij dike. Di destekî de destmal, di destê din de jî telgraf.
«Ez fahm nakim, hûn çawan dikarin telgrafeke weha vekirî bişînin? Ma hûn evçend bi fransizan bawer in?.. Ez ji we re bibêjim, ew niha baş pê hesiyan ka em bi çi bilî dibin.»
Memduh Selîm Begê hêrsbûyî nexweş e jî. Wî serma girtiye. Bîvila wî tê, gewriya wî dişewite, bêhal e. Lê digel vê hindê jî, ew li Helebê ye. Erk û mesûliyet bi ser her tiştî re ne. U meraq. Çi qewimiye? Çima telgrafeke weha dilsoj ?
Bi dû biryara baş re, ev telgraf û serma. Siûd. Qeşmeriya siûdê. Hema piştî wê şeva meyxanê, ew rahiştibû penûsê û ji bav û xwişka xwe re nameyeke dirêj nivisîbû û bi alîkariya fransizekî name, bi destan, şandibû Stembolê. Ew li hêviya bersîvê bû da ku roja dawetê belî bûya. Lê di dewsa bersîvê de ev telgraf hat.
«Mîrên min, mesele çi ye?»
«Memduh Beg, Ihsan Nûrî dîsan xeber şandiye. Ji aliyê eskerî halê wan baş e. Ew xwe dirêjî Wanê, Erzurimê dikin. Xelk tên û tevî wan dibin. Lê ew nikarin agirê şoreşê gurtir bikin û wê firehtir bikin. Welê dixuye ku wan kadir û îmkanên siyasî tune. Heke çend kesên din wekî Ihsan Nûrî li wê derê bin, em bawer in, rewş

dê, bi temamî, biguhere. Ji ber vê yekê, em divê xwe bigihînin Agiriyê. Jixwe berê jî, me qerareke weha hebû. Lê belê, tu kes ji me nikare here. Hin ji me bêpaseport in, hin ji me jî nû hatine û di bin çav de ne. Ji bo ew hevalên ku bêpasaport in, em h Beyrûdê bi hin er-
125

men û fransizan re peyivîn. Heta du-sê mehan çend pasaport dê hazir bin... Memduh Beg, me dil hebû ku em ji te bipirsin ka te îmkan û daxwaz heye... ji bo du-sê mehan... heta em, çend heval, xwe digihînin Agiriyê... Tu merivdewletên Antaqiyayê baş nas dikî... heye ku ew pasaportekê bidin te û tu bikaribî xwe, ji ser Iranê, bigihînî Agiriyê...»
Agirî... û Memduh Selîm Beg. Memduh Selîm Beg li ser Agiriyê! Tiştê ku qet nedihat bîra wî. Rê û xaçeriyên siûdê. Li ser riya zewacê xaçeriyeke nû; Agirî. Ji nişkekê ve.
Ew çi bibêje?
Dîsan du deng; dengê dil û dengê mêjî. Dîsan şer. Şerekîbêhempa. Çi divê? Çawan? Kîjan rê?
«Mîrên min, ez bi kêfxweşî derim. Lê ez nizanim ka ez dê, h wan deran, bi kêr werim... Hûn jî dizanin, ez ne peyayê çiyan im...»
Berberiyeke malkambax; «ez derim...» Lê... «lê»yeke pirstijî. Bi dengekî ketî û nexweş.
«Hele em binihêrin... Ez divê bi merivdewletên Antaqiyayê re bipeyivim. Bi hênceta çûyina Awrûpê...

Heta hefteyekê ez xeberekê digihînim we...»
18
Rêwîtî. Şeva berîrêwîtiyê.
Mala xwezûran. Her çar. Bêdengî. Awayekî zîz.
Qahr. Şîva êvarê. Şeva dawîn. Dotira rojê rêwîtî.
Her kes li ber xwe dinihêre û şîva xwe dixwe. Saetên dawîn û paşê veqetîn. Bi tenê ew dizanin ku Mernduh Selîm Beg dê, ji bo du mehan, ji wan veqete. Lê ew nizanin ber bi kû de. Sibê, di berbangê de, Memduh Selîm Beg dê ber bi deverine bi rê keve. Bi dû biryara zewacê re, niha, ev rêwîtî. Wekî ku sêleke xişor bi ser dil
126

û hinavan re wer be.
Memduh Selîm Beg nabêje ka ew dê ber bi kû here. Ew jî napirsin. Lê ew bîr lê dibin. Ma weha ji nişkekê ve, Memduh Selîm Beg dikare ber bi kû here? Ma çi dikare evçend girîng be ku ew ji ber deriyê zewacê bi şûn de vegere û dest bi rêwîtiyeke dirêj bike?
«Hûn haziriyên dawetê bikin... piştî du mehan, ez li vir im. Hingê em dê daweta xwe, bi kêf û xweşî, çêkin.»
Kes nakene. Kes nabêje belê. Deng ji kesî dernakeve. Bi tenê, ew li wî dinihêrin. Bi çavên keserkûr û meraqtijî. Wekîku şîn ketibe dewsa dawetê.
Ew çi bike? Ew dest bi qîrîn û zarîneke dilsoj bike?..
Na, nabe. Şerm e. Ne li gor edetan e. Şîva germ û tîkeyên biçûk yên goştê ji gewriya nesax dadiqultin. Agir

bi gewriyê, bi dil û kezeb ketiye. Dil dibihure.
Ew. Xezalê. Çavên kentijî niha nakenin. Carina çav bi nêrîneke dilsoj û kelgirî li Memduh Selîm Begê dinihêrin. Çav jê dipirsin; tu çi dikî? Çima tu min li van deran dihêlî? Te hay ji xwe heye?
Ka ew çavên germ? Ew rojên li mala Memduh Selîm Begê, yekitiya beden û çavan, çavên germ û ronî û niha jî ev çav... Fer di çavan de nemaye. Bîbûkên xweşik yên çavan di bin bîrkok, mêjang û mijgulan de dilîzîn. Lê giran, giran. Westiyayî. Li ser bîbûkan ew xweşî û rindiya her gavî dixuyin. Lê perda xemgîniyê jî...«Rebenê... rebenê!..» Ev çav, ev hinarok, ev lêv, bi kurtebirî, ev rû di bin ronahiya çirê de wekî rûyê melayikekê dixuye.
Germiya evînê jî bi ser Memduh Selîm Begê re tê. Dil di şewateke yaman de ye. Gelo ew çi bike?.. rabe pê û wê hembêz bike, ramûse, ji destê wê bigire û bi xwe re bibe? Çi bike? Ew nikare xwe li ber nêrîna van çavên
127

kelgirî ragire. Tiştekî divê. Xezalê divê fahm bike ku ev rêwîtî ne rêwîtiya mirinê ye. Ev rêwîtiyeke mecbûrî û kin e. Bi tenê du meh. Bi dû du mehan re jî kêfxweşî, yekîtî, dilgermî û serfirazî.
«Qet meraq mekin, piştî du mehan, ez têm. Ez malê jî teslîmî we dikim. Ji kerema xwe re carina herin û lê binihêrin... Mîrê min, bav û xwişka min dê name bişînin. Piştî ku name hat, tu dikarî xeberekê bişînî û ji

wan re binivîsî ku em dê daweta xwe piştî du mehan bi ser xînin...»
Keneke ne ji dil. «Baş e, Memduh Beg, ez'ê xebera dawetê bigihînim wan.»
Di bin perda bêdengî û xemgîniyê de şeva dawîn û xatirxwestin.
Xatirxwestin, veqetîn û rêwîtiyeke du mehan. Piştî du mehan jî daxwaza dilan...
Lê siûd? Henekî û qeşmeriyên siûdê?
128

TARÎX Û SIÛD

1
Agrî, Agrî tu agir bûyî
Li nav ketî, serbilind bûyî
Li ser Kurdistanê çira bûyî
Hilbe Agrî, hilbe Agrî
Agirî. Çiyayê serbilind. Di nav kirasekî spî de rapê-çandî. Serî bi mij û dûman. Agirî, çiyayê berz û kevna-re. Ziyaretgahê dîndar, evîndar, derwêş û bîreweran. Warê şervanan. Kaniya xurtî û mêraniyan. Navenda se-rîhildanan. Agirî, çiyayê ji agir. Çiyayê serî di asmanan de. Keleha parastina xweyiyê. Keleha Xoybûnê.
Li ber quntaxên çiyê şervanên kurd. Çekdar. Deng-dar. Strana Agiriyê. Bi dengekî. Hemû bi hev re. Li nik wan kumandarên wan. Ihsan Nûrî Paşa, Biro Heskî TellîPaşa, Temirê Şemkî, Şefdîn Beg, Ferzende Beg.

U h hember wan jî Iskender Beg. Yanê Memduh Se-
lîm Beg.
Alaya kurd ya rengîn h zinarekî hildibe. Dinya sar e.
Berf ketiye çiyê. Spêdê çiyê di nav berfê de, kirasê spî
lê ye.
Agirî...
130

Agir dirijand ser seran
Ronahî direşand her deran
Erd dihejand car caran
Hilbe Agrî, hilbe Agrî
Marşa şervanên kurd. Dastana serîhildana kurd ya A-
giriyê. Xeşm û xezeba çiyayê Agirf.
Şervanên kurd xêrhatin li Iskender Begê dikin. Is-
kender Beg, çend kurdên Iranê û du ermen li şervanên
kurd dinihêrin. Bêdeng. Bi ken. Dilê wî wekî dengê çi-
yayê Agiriyê hildavê. Germ û bi lez. Heyecaneke boş
dil û mêjiyê wî vegirtiye. «Xwediyo! Tu qadir î. Ma
min dê ev roj jî bidîtina?..» Leşkerên kurd, kumanda-
rên wan, alaya kurd axa rizgarkirf... Jiyaneke ji nîr û
zordariyên xerfban bi dûr...
«Iskender Beg û gelî hevalan... Hûn bi xêr û xweşî
hatin. Em, esker û kumandarên şoreşa kurd a çiyayê
Agiriyê silav li we dikin. We em kêfxweş û serbilind ki-
rin... Bi xêr be.»
Dengê Ihsan Nûrî. Dengekî xurt û hişk. Dengê ser-
leşkerekî.

Iskender Beg kelgirî ye. Ji kêfxweşî û heyecanê.
Deng jê dernakeve. Ew dizane, eger ew devê xwe veke, ew dê bigirî. Tu carî tiştekî weha neqewimîbû, ew evçend bi agirê heyecanê nehatibû sotandin, pêtên heyecanê tu carî, evçend bi xurtî, bi ser wî re nehatibûn.
Li ber çavên hemûyan, Memduh Selîm Beg tiştekî dike; ew çogên xwe datîne erdê, ber jêrî erdê dibe û axa reş radimûse. Sê car. Giran, giran. Bi dû ramûsandina axê re, ew misteke ax dixe nav lepên xwe û axa reş bîhn dike. Dirêj, dirêj. Ew li ax, ala, çiya û şervanên kurdan dinihêre. Dirêj, dirêj.
Ihsan Nûrî Beg tê û wî ji erdê radike. Ew, bi ken, li
131

hev dinihêrin û hevûdu hembêz dikin. Pihêt. Car bi car. Bi dirêjahiya deqfqan. Paşê jî ew, bi hev re, ber bi kumandar û şervanan derin. Ihsan Nûrî Beg wan, yek bi yek, bi Memduh Selîm Begê dide nasîn. Ew jî wan, yek bi yek, hembêz dike. Bi qasî 70 kesan. Yek bi yek. Ihsan Nûrî Beg û ew du ermen jî li nik.
«Begê min Ihsan, ez dixwazim alaya serbestî û azadiyê jî ramûsim. Ji min re vê çêyiyê jî bike, ji kerema xwe re, wê bîne, ez wê ramûsim û bîhn bikim. Bîhna serbestî û azadiyê bigirim...»
2
Ihsan Nûrî. Ihsan Nûrî Begê Cibirî. Bêdlîsî. Seresker. Jiyana wî ya bûyertijî; zaroktiyeke şêrîn li Bêdlîsê, li taxa kevn Elî Kolî, xortiyeke bi keft û left, xwendin û

hînbûn li Stembolê, salên xwendegeha eskerî «Harbiyê» li Stembolê, bi kurdan û rêkxistinên kurdan re xebat, hêviya yekîtî û azadiyê, seresker û zabît, di şerê cîhanê de kumandar, kumandarê leşkerên Osmanî yên bajarê nik çiyayê Agirî Bayzîdê, destpêka hevaltiya wî û çiyayê Agiriyê, li dijî leşkerên ordiya Qeyserê Rûs şerkirin, piştî damezrandina Komara Turkiyê li dijî siyaseta tirkan xebatkirin, yek ji hîmdarên rêkxistina kurdî Komîteyî Istîklalê Kurdîstanê, di sala 1924 an de, tevî hevalên xwe, li dijî dewleta tirk serîhildan, şikestxwarin û rev, endamê Xoybûnê, serokê leşkerî yê Xoybûnê û Agiriyê.
U kumandarê serîhildana Agiriyê.
Ew û Memduh Selîm Beg bi hev re. Di qerargahê serîhildanê de. Bi dû salên direj, xirab û musûbet re. Dostên kevn. Hogirên riya man û nemanê. Şirîkên tarîxeke bextreş.
Du şexsiyetên ji hevûdu pir cihê. Lê di eynî wext de
132

jî wekhev. Di rûpelên kitêbeke kevnare. Rûpelek ji serî heta binî tijî. Bi rêzên direj û bi tîpên pir biçûk. Lê xweşnivisî û bi rêk û pêk. Rûpela din neqişandî. Tê de bi tenê çend rêz. Peyvên kin û kurt. Lê baş lihevhatî û manetijî. Her du rûpel jî balkêş. Her du jî yên kitêbekê; Ihsan Nûrî û Memduh Selîm.
«Mîrê min, me pir bêrî li te kiribû. Çaxa em heval li hev diciviyan, me bi tenê qala te dikir. Qala te û qeh-

remaniyên te... Pir spas Ihsan Beg, pir spas... te em ser-
bihnd û serfiraz kirin. Te welatê me vejand...»
«Bi xêra we Memduh Beg, bi saya Partiyê... min tiş-
tekî nekiriye. Ji erkên kurdbûnê pê ve tu tişt. Ez yek ji
lawên heqîr û biçûk yên vî milletê bextreş im. Ma ez
nexebitim, kî dê bixebite?»
Di nav xaniyekî yekçavî û tarî de peyvên germ û dil-
soz. Xaniyekî bi kevirên reş lêbûyî. Di bin kozika ken-
dalekî de. Ji çavên neyar bi dûr. Xaniyekî sade. Na, ne
sade, belengaz. Tê de doşegin pûştijî, bahhfin li ser, li
quncikekê mankaleke stûr û li quncika hember jî çend
cot rext, pûsat û tifing.
Li ser Ihsan Nûrî Beg jî kincên germ yên leşkerî. Li
ser sîngê jî, ji her du milan, du rext. Bi awakî çaprazî.
Li ser rextan malxelîtikine. Li piştê jî cewdikekî çerm
û tê de debançeyeke stûr.
Li her cîhî, bi her şeklî, nîşandekên şerê.
Rewş?
«Iskender Begê ezîz... Çêtir e ku em bi vî navê bang
li te bikin. Bila tirk nizanibin ka tu kî yî... Rewş ne ze-
lal e. Ev dibe zivistana çaran ku em şer dikin. Bi hêzeke
pir kêm û ji îmkanên herî pêwist bêpar. Lê digel vê
hindê, em li ber xwe didin, êrîş dibin ser dijmin û warê
şoreşê firehtir dikin. Tirk baş têgihîştine ku dijminên
wan bêtirs, şarezayên şer û navçê ne. Ji ber vê yekê,
133

wan ji aliyê Turkiyê esker anîne û li navçê civandine.

Wan dil bi çend tiştan heye; 1- Bi zor û hovîtî çavê xelkê tirsandin û peywendiyên xelkê û şoreşê birîn, 2- Xelkê û nemaze wan eşîrên ku dostên dewletê ne, li dijî şoreşê rakirin, 3- Bi dan û standinên dîplomatîk ji dewletên cîran, yanê ji Yekitiya Sowyetê û Iranê alîkarî wergirtin û bi vî awayî riyên şoreşê birîn, 4- Dor li şoreşê girtin û şoreşê vegivezandin... Dek û dolabên wan hemû ji bo vê planê ne...»

U xeber... xeberên tahl û nexweş. Xeberên xweş û çê. Kurdên xayin ku libasên şervanan li xwe kirine û çûne êrîş birine ser qereqolên Iranê, ji bo ku Iranê li dijî serîhildanê derxin. Li dijf van kurdan şer bûye û serokê wan hatiye kuştin. Belavokekê li ser van bûyeran hatiye nivîsîn. Bi navê Navendiya Xoybûnê. «Pêwist e, nîştimanperestên kurd kelkên siyasî û aborî yên dewleta Şahenşahî ya Iranê ragirin, biratiya manewî û siyasî û bêlayenî ya dewleta Şahenşahîbi dest bînin...»

Balafirên tirkan bi agirê mîtralyoz û bomban êrîş birine ser gundan. Du eşîrên mezin hatine û tevî serîhildanê bûne. Şervanên kurd xwe dirêjî Wanê kirine. Şêx Mihemedê Hesesorî ku peyayê tirkan bû, di gund de hatiye kuştin. Desteyeke şervan du mifrezeyên tirk ji çek kirine û çekên wan wergirtine. Leşkerên tirk çarde gund ku nêzîkî warê serîhildanê ne, kavil kirine û şêniyên gundan şandine Anatoliyê. Li deştê şerekî mezin qewimiye, ji dijmin gelek kes hatine kuştin, ji kurdan jî çar kes, şervanan bi qasî 20 leşkerên tirk jî dîl girtine. Herweha... Ji her alî xeber û nûçeyên şer. Her cîh bi

agirê şer dişewite. Kuştin, mirin, êrîş, agir, dîlgirtin, tirsandin, çek, balafirên bombebaranê, tanq û bombe... peyvên ku car bi car bi guhên Memduh Selîm Begê dikevin. Ev cîhan, cîhaneke taybetî ye ku ji êgir avabû-
134

ye. Di nav cîhana bêdeng û westiyayî de cîhaneke ji agir... Belê, Agirî di nav agir de ye. Telgrafa ku hevalan ji Memduh Selîm Begê re şandibû, rast digot.
Memduh Selîm Beg û Ihsan Nûrî Paşa bi hev re. Bi tena serên xwe. Lê, gelek kes tên û derin; ew nameyekê didin Ihsan Nûrî Paşa, jê tiştine dipirsin, xebereke nû diguhezîninê, jê fermaneke nivisandî dixwazin.
Memduh Selîm Beg li ber xwe dikeve. Ev peyayê xebatkar û fedakar, ev şerê mirin û mayinê û Memduh Selîm Beg û hevalên wî... Ew li Antaqiyayê, Helebê, Şamê, Beyrûdê, Kahîrê, Iskenderiyeyê, Suleymaniyê, Parîsê û Londonê çi dikin? Ma meriv dikare xebatên wan û xebatên van canfedayiyan bide ber hev? Memduh Selîm Beg, niha, têdigihê; ev cîhana şer û xwînê û cîhana derve, wekî rengên reş û spî, ji hevûdu cihê ne. Li vê derê kar û bar pir in, tiştên ku divê werin kirin, bi hezaran in.
Memduh Selîm Beg dikare di nav van du mehan de çi bike?.. Mixabin, tiştên ku ew bikaribe bike, ne zêde ne. Heta radeyekê alîkarî ji bo xurtkirina teşkîlata Xoybûnê û civînên siyasî bi serokên serîhildanê û komikên teşkîlatê re. U heye ku alîkarî h rojnama serîhildanê

«Agrî»yê kirin. «Iskender Beg, ka tu bizanibî em vê rojnamê çawan derdixin!.. kaxiz bi qasîku têr bike tune. Ji ber vê yekê, ew kêm derdikeve. Me tu çapxane jî tune. Ji lewre, ew bi dest tê nivîsîn, û hinekîjîbi jelatînê kelandî û sarkirî...»
Serîhildaneke pêwist. Lê di nav kesp û kosp û neçariyan de.
3
Dawiya payiza 1929 an. Destpêka zivistanê. Spêdê çiyayê Agiriyê di nav berfê de ye. Dengine jê tê. Dengê
135

ba û bagirê. Nalîna çiyayê serîmij. U li jêr jî, li ber lingê çiyê, strana dengbêjê dilsoj. Nalfna çiyê û dengê dengbêj; dastana serîhildanê. «Ax lo bira, lo bira, lo bira, lo bira...»
Evar. Agirekî xurt. Şewata êzingan. Agirê şeva Agiriyê. Li dor êgir şevanên westiyayî. Dengbêj. U Memduh Selîm Beg. Hemû li dor êgir rûniştî. Pêtên êgir; ber bi jor, ber bi asmên. Govenda pêtên êgir, U bê guman, strana dengbêj. Giran giran. Siya sor ya pêtên êgir li ser rûyê Memduh Selîm Begê. Di bin ronahiya sor de rûyekî sor. Dest li ber germiya êgir. Çav vekirî. Li ser çavan çirûsk. Guh li ser stranê. Peyv û gotinên stranê yên li ser bûyerên nû, lê rîtm û awayekî kevnare. Rîtm û awayê dastanên sedsalan. «Ax dilo!..» Dilê bi coş û heyecan. Dilê westiyayî û bi hesret.
U ewana. Di bin ronahiya sor de rûyên wan yên sor.

Eniyên qermîçektijf. Simbêlên badayî. Kinc û libasên wan. Li ser sîngan rext. Li ber piştan kêr û xençer. Tifingên reş, bi awakî çeprastî, li nik wan. Piranîgundî. Ji ser zevî û bênderên xwe hatî. Lawên eşîran. Hevalên deşt, zozan, newal û çiyan. Zarokên tebîetê. Xurt wekî pole. Zû û pihêt wekî berika tifingê. Nîşanker wekî pilinga li pey nêçîrê. Ewana; her yek ji derekî. Ji gundên doraliyê Agirî û Bayzîdê, ji aliyên din yên tixûba Iranê, ji deşt û newalên Wan, Mûş, Melezgirt, Hekkar, Qers, Erzurim û Dêrsimê. Lê belê, hemû wekhev. Wekî ku hemû ji dayikekê. Tiştê ku bi yekî qewimiye, bi yê din jî qewimiye... Jiyaneke wekhev. Hîsekî yekgirtî. Şirîkên qederekê. Qedera wan; rebenî, belengazî, neçarî û bindestî.
Şoreşa wan; li dijî vê qederê serîhildan.
U ew. Dengbêj. Di bin ronahiya sor de rûyekî gulover û sor. Dengekî berz, lê melûl. Hêdî, hêdî. Bi rêk û pêk
136

Gotin û qise li pey hev rêz dibin. Wekî rêzên gulên sor. Her qise dibe guleke sor. Her gotin dibe novikeke nû ya rêzeke dirêj ya gulan. Di bin nalîna çiyayê serîbilind de, li dor agirê gur, rêzên gulan. Yekitiya dengan; dengê ba û pûkên çiyayê Agirî, dengê şewata êzingan û dengê dengbêj.
U ewana; xwediyên şoreşê, xwediyên serîhildana kurdan ya Agiriyê.
Memduh Selîm Beg... mêvanê wan. Bi wan re. Ihsan

Nûrî û kumandarên din çûne cîhine. Wan Memduh Selîm Begê ezimandine. «Bi ser serê min... bi kêfxweşî.» Dilê Memduh Selîm Begê hildavê. Dil bûye wekî kelekekê. Kelekekê ku li ser pêlên avê hêl dibe. Ew li ser axa azadkirî rûniştiye û di bin êvara azad de azadiya rastî dadiqultîne. Qult bi qult.

4

Zivistan. Sar, serma, pûk. Berfê bi kirasê xwe yê spî hawirdor vegirtiye. Rê hatine girtin. Şer, hatin û çûyin kêm bûye. Ordiya tirkan xwe spartiye bajarên mezin. Kurdan jî xwe spartine gundên nêzîkê Agiriyê. Memduh Selîm Beg jî xwe spartiye odeyeke germ. Na, ne ode, şikefteke germ. Ew û serokatiya serîhildanê, tevî mal û zarokên xwe, di şikeftan de bi cîh bûne. Şikeft di qelaşeke kuntarên çiyê de ne û ew ji dinya derve, ji ba, bahoz û bagirê berfê veşartî ne. Dijmin jî nikare xwe bigihîne şikeftan. Ew di nav kortalekê û di dawiya bihureke asê de ne. Ji teyran pê ve, tu kes, bêyî rêdanê, nikare xwe bigihîne wan. Dinyake taybetî. Di nav dinya stûr û tevlihev de dinyake biçûk û jibîrbûyî... Tu kêmaniyên şikeftan tune; di her şikeftî de girekî ji êzingên hişk, di nav kedik, meşk, tûr, têr, teliz, dîzik û kûpan de xwarin, terzad û zexîre, li quncikekî şikefte-

kê firax, libasên eskerî yên germ, postalên berfê, mankalên stûr, gaz, tifik û çire, kulavên qehîm yên hiriya meşîn, çek û cebirxane... û li şikeftekê jî tawleyeke

hespan, kadîneke mezin û bêr, qazme, sepet, sêlik. Memduh Selîm Begê «şervan.» Di şikefta xwe de. Tevî çend kesên din. Li kêleka mankalê. Li serê libasên germ yên leşkerî, li ser milên wî kulavekî şivanan, di lingan de jî goreyên rengîn û neqişandîyên rîs. Rîhdirêj. Jarbûyî. Bêdeng. Pojandî. Di destan de penûs û kaxiz. Rêveçûneke dijwar di nav fikir û gumanan de. Pîqe-pîqa hevalên nik wî. Ji dûr, ji şikeftekî din kûze-kûza seg û tahjiyan.

Ew du mehên ku qelw lê hatibû dayin, bihurîn. Lê ne Memduh Selîm Beg zivirî Sûriyê û ne jî kesine hatin Agiriyê. Rê li wan hatiye girtin. Zivistan, berf, serma, ordiya tirk ku h dor navçeyê serîhildanê ye û Iran. Iran jî ji serîhildanê eciz e û zehmetî nîşan dide. Yanê, veger hê jî dûr e. Memduh Selîm Beg jî, zêde, qala vegerê nake. Ji şerman û dudilîbûnê. Ew dê van merivên fedakar li vê derê, di nav xwîn, agir, barût, berf, serma û mirinê de bihêle û here!.. Fikirandina vî tiştî bi xwe şermeke mezin e. Ma çi yê wî ji van merivan zêde ye? Çima ew dê here û ev dê bimînin?

Mêjiyê wî weha dibêje, weha deng dike. Lê dil? Dengê dil?.. Wî ji Xezalê û malbata Xezalê re gotibû du meh. Bi tenê du meh. Li milê din, li ser qewlê xwe nesekinîn jî şerm e. Derewkar derketin jî xirab e... Lê digel her tiştî, kêfxweşiyekê jî pê re dixuye ku ew h nik şervanan maye, nan û ava wan parve kiriye û bûye şirîkê qedera wan, bi kurtebirî, bûye yek ji wan

Lê belê, ew divê, bi awakî, xeberekê jî biguhezîne

Xezalê û bavê wê. Kaxiz û penûs di destan de, ew rûniştiye û dil dike name binivîse. Hem ji bavê Xezalê re
138

û hem jî ji wê bi xwe re. Heta niha, wî, tu carî, jê re name nenivisiye. Lê ew dê, niha, edet û toran bide bin hngên xwe û jê re binivîse. Çima na?.. Belê, nameyeke dirêj û germ. Bi hal û hewal tijî. Bi zimananîna hesretê. Bi qedr û qîmet.
U bê guman, bi hêviya ku name bigihên destê wan. Ne ew, ne jî kesekî din dikare bizanibe ka name dê bigihên cîh. «Xwedê dizane!» Lê wî hêvî heye ku name dê bigihên cîhê xwe. Ew dê pêşî bigihên Bayzîdê, ji Bayzîdê bigihên Stembolê, ji Stembolê bigihên Helebê û ji Helebê jî Antaqiyayê. Riyeke dirêj. «Çavê bêgaviyê kor be!..»
5
Siûda Memduh Selîm Begê! Ew dfsan nexweş e. Di vê berf, baran û sermayê de. Ew dfsan bi zekemiyê ketiye û serma girtiye. Ew diricife. Jiyana şervaniyê... Zehmetî û neçarî. Ne bi tenê li dijî dijmin şerkirin, herweha li dijî kesp û kospên tebîetê û hezar texlît bêgaviyên din jî şerkirin. Çaxa meriv nexweş e, ji bêgaviyê, meriv xwe davêje hawara Xwedê. Xwedê divê alîkarî bike. Bijîşk tune. Derman kêm e. Nexweşxane tune. Bi kurtebirî, dinya şervanan; dinyayeke taybetî ji tunebûnan.
Ma Memduh Selîm Beg bi vê yekê nizane? Belê, ew

dizane, baş dizane. U ji ber ku ew dizane, ew xebata siyasî dike, li dijî dewleteke jixwerazî radibe, tê warê şervanan û di warê wan de nexweş dikeve.
Yanê tarîx û siûd... yekitiya tarîx û siûdê.
Tarîx çi ye? Axureke peregende û bêhîs û bêpejn ya heywanan? Yan jî bexçeyekî rengîn, gul û kulîlktijî yê merivan? Çi? Kîjan? U tarîx û meriv... Kî di xizmeta kê de? Meriv di xizmeta wê de? Yan jî ew di xizmeta
139

meriv, jiyan û kirdeyên merivan de? Çi? Kîjan?.. Pirsiyarên ku mêjiyê Memduh Selîm Begê pê bilî dibe. Ji rojên xwendegehê û vir ve. Li gor wî tarîx do, îroj û sibe ye. Yanê rabirdû, niha û pêşeroj. U di navenda wan de jî meriv. Eger meriv, hêz, quwet, ked û daxwaza wî ya pêkanîn û afirandinê nebin, hingê tarîx çi ye? Tiştê ku Memduh Selîm Beg ji tarfxê fahm dike;lirabirdû xwedî derketin, gava nû zanîbûn û her gav pêşketin, nûkirin, zêde-çêtir-xweştirkirin. Gava pêşketin, nûkirin, çêtirkirin tunebe, hingê tarîx jî nabe. Fikir, guherîn û tarîx, ev her sê bi hev re mihorên wextê ne. Tarîx, tarîxa merivan e. Tarîx xizmetkara merivan e, ne li bervajiyê. Lê belê, bi şertê ku meriv jî bikaribe tesîr lê bike. Eger meriv dixwaze xwediyê tarîxeke taybetî be, eger meriv naxwaze wekî heywanekî bêtarîx bimîne, hingê meriv divê xîret bike û hewl bide ku tesîr li tarîxê bike.
Memduh Selîm Beg di nav cîhê xwe yê germ de dirêj

bûye û li tarîxê difikire. Ew rojên xwendegehê û xeberdan û gotarên felsefî tên bîra wî. Xwediyo ew çi roj bûn! «Tarîx ne axura bavê kesî ye... Tarîx ne tîkeyên goştê pijirandî ye ku meriv lê rûne û daqultîne... Hevalno, tarîx tê afirandin. Digel her bela, zor û zehmetiyê ew tê afirandin. U em ji bîr nekin... sedsala me sedsala afirandina tarîxên milletên mazlûm e.»
U xeberdanên zimanzanan li ser peyva tarîxê!.. Gava ew niha wan xeberdanan bi bfr tîne, pîqepîq pê dikeve, «Birano!.. ev çi ye, hûn dibêjin tarîx, tarîx... Ma hûn nizanin ku peyva tarîxê erebî ye. Çima hûn nabêjin dîrok? Dîrok peyveke xwerû kurdî, zelal û xweş e...»
Ax ew rojên xweş, lê ji rastiyên jiyan û tarîxê bi dûr! Rastiyên jiyanê; warê şerên tarîxê. Rastiyên j'iyanê ;
140

Şerekî dijwar, bêhempa û bêrawestan. Kî di vî şerê malkambax de bi ser keve, ew dibe hukimdarê rastiyên jiyanê jî. U herweha tarîxê.
Tiştekî balkêş. Memduh Selîm Beg, niha, di nav şikefteke tarî de, li hember kozên êgir yên mankalê, dirêj bûye û bi taya sermayê diricife. Lê mêjiyê wî bi firê dikeve û dere rojên kevn. U gava ew rojên rabirdû dikevin bîra wî, pîqepîq pê dikeve. Digel ku halê wî yê niha ne tu hal e. Ma ev yeka bi xwe jî nîşan nade ku tarîx lehiyekê ye? Lehiyekê ku her ber bi pêş diherike. Lehiyekê ku xwediyê kahniyekê ye. Lehiyekê ku li ser

riya derya stûr, zelal û xweş e.
Belê, welê ye; rabirdû, rojên bihurî di kûrahiyên mêjî de dijîn. Ew li ser dil veniştî ne. Dilê Memduh Selîm Begê carina bi kêfxweşî û carina jf bi jan û keserên wan hildavê. Ew tu carf ji wî bi dûr nakevin. Belê, rast e; ev rojên ku Memduh Selîm Beg dijî jî, ne rojên hêsan in. Rojên zehmettijî, rojên giran, rojên bi keser û hesret in. Lê belê, eger rabirdû ji bîr bibe û îroj neyê jiyîn, hingê meriv dê çawan bikaribe tesîr li tarîxê û li pêşerojê bike? Ew dizane, niha, edalet, serfirazî û kêfxweşiya hem şexsî, hem neteweyî li ser spêdê çiyayê Agiriyê ye. Ronahî li pey çiyê ye. Ji bo ku ronahî, edalet, serfirazf û kêfxweşî bi dest kevin, digel her celeb zehmetiyê, meriv divê hilkişe ser spêdên çiyayên serbilind û wan vegire. Mixabin, hezar mixabin ku tarîx ev e û evçend dijwar û zehmet e.
Ji niha ve, ew nizane ka rojên pêş dê çi nîşanî wî bidin û pêleh tarîxê dê wî ber bi kû bibin. Lê, ew dizane ku gava tarîx tora xwe dihûne, meriv jî divê alîkarî lê bike.
Tarîx tora xwe dihûne. U li nik tarîxê jîsiûda Memduh Selîm Beg, hêdf hêdî, dineqişe
141

6
Ihsan Nûrî Beg, Yaşar Xanim û Memduh Selîm Beg.
Her sê bi hev re, di şikefta Ihsan Nûrî û Yaşar Xanimê de. Ihsan Nûrî Beg kêfxweş e. Wan bi qasî duwanzde

telefon bi dest xistine û jê re sîm jî peyda kirine. Ihsan Nûrî Beg bi xwe, tevî desteyeke siwar, sîm bi dest xistiye. Wan xwe dirêjî Bayzîdê, ordîhegê tirk kirine û ji ber mala reîsê riya hesin, bi qasî pêwist, sîm wergirtine û anîne. Di wê şeva tarî de, nobedarên tirk dîtine ku ew sîm bar dikin, lê ji tirsan dengê xwe nekirine û rûyê xwe badane û çûne hundir. Niha, bi alîkariya telefonan, ew dikarin çêtir bi gundên doralî re peywendî dayinin.

Yaşar Xanim. Jineke xweşik, bîrewer û qedirgir. Jineke tirk, lê pîrek û evîna Ihsan Nûrî Begê. Dostî û hevaltiyeke kevn di navbera herduyan de. Ji rojên Stembolê heta îroj. Hevala Ihsan Nûrî Beg ya qederê. Ihsan Nûrî Beg li kû, ew jî li wê derê. Niha jî di nav agir, berf û sermayên Agiriyê de. Evîndareke yekta.

Berî niha bi demeke kin, tirkan Yaşar Xanim li Turkiyê girtibûn û dixwestin, bi hênceta Yaşar Xanimê, xwe biginînin Ihsan Nûrî Beg da ku ew dev ji serîhildanê berde. Çi xewn! Çi kirêtf! Hukimeta tirk heyeteke fireh ji payitextê, ji Ankarê dişîne da ku bi Ihsan Nûrî Beg û serokên serîhildanê re bipeyivin. Du parlementer, qumandarê tumena tirk ya Agiriyê, fermandarê jandarmên Bayzîdê û çend zabît. Kurdan qebûl e ku ew heyeta tirkan bibînin... Li ser tixûbê Iran û Turkiyê civîn çêdibe. Heyeta tirkan û kurd. Kurd; Ihsan Nûrî Paşa, Biro Heskî Paşa, Ferzende û Xalis Began û bi qasî 20 siwarên herî baş yên desteyên leşkerî yên kurdan. Çavpêketineke ecêb. Çavpêketinekê di navbera a-

gir û avê de. Daxwazên heyeta tirk; «1- Agirî divê aram
142

be. 2- Kurd divê dev ji rêgirtin û xirabîkirinê berdin. 3-
Tiştên ku şervanên kurd bi dest xistine, divê bi şûn de
werin dayin. 4- U ji her tiştîzêdetir, Ihsan Nûrîdivêji
Agiriyê derkeve, bi her şertê ku ew bi xwe bixwaze...
û herweha tu xirabî dê bi rûniştevanên Agiriyê nebe,
dewlet dê alîkarî li wan bike û rehetiya wan temîn bi-
ke...»
Ihsan Nûrî û hevalên wî li hember van daxwazan di-
kenin. Keneke xweş li ser rû û çavên Ihsan Nûrî û he-
valên wî. Bi qasî bîskekê. Fen û dolabên dewletê. «Di-
yar e, dewlet dixwaze me bixapîne!..» Ew daxwazên
heyetê red dikin. «Azadiya Kurdistanê!..» Dewlet diza-
ne ka şervanên kurd çi dixwazin. Alaya sêrengîn ya a-
zadiya Kurdistanê divê li spêdê çiyayên welêt hilbe. Ji
kurdan bêtir, baştir û çêtir tu kes nikare welatê kurdan
îdare bike. Dewlet divê, êdî, bi vê yekê bihese!..
U Yaşar Xanim. «Jina min bişînin Helebê...»
Rêwîtiya dirêj û bi xeter ya Yaşar Xanimê. PêşîHe-
leb. Bi dû Helebê re Iran û paşê jî Agirî. Lê li ser riya
hatina Yaşar Xanimê, li Iranê xetereke hîn mezin... Ih-
san Nûrî Beg bi xwe dere Iranê, bajarê Xoyê. Ji bo a-
nîna hevaljina xwe, Yaşar Xanimê. Pêşî ew yekî dişîne
bajarê Xoyê. Lê digel ku demeke dirêj, bi qasî deh ro-
jan dibihure, ew tu xeber nagire û meraq dike. Bi dû
deh rojan re, ew û kurdekî bi navê Silo derin bajêr. Ci-

lên kevn û peritî yên kurdî lê. Tifing li ser mil. Peyatî. Li bajêr jî li mala feqîrekî ew mêvan dibin. Yaşar Xanim hê ji Tebrîzê nehatiye. Ew li wê derê dimîne û yekî dişîne pey Yaşar Xanimê. Kesê çûyî venagere. Piştî çend rojan, rojekê Ihsan Nûrî Beg dadikeve bajêr. Kumekî pehlewî li ser sêrî. Ji nişkekê ve dengine. «Efendî efendî!» Leşkerên iranî. «Min gazî te kir, çira nesekinî?» Leşkerekî îranî, rûtirş, bihêrs, jê dipirse. «Te e-
143

fendî, efendî, gazî dikir, ez çi dizanim efendf kf ye. Ez tu efendf nîn im...» Leşker û zabft. Ji Ihsan Nûrî Begê pirsine. Bi hev re, ber bi Tehwîlê Dijban(polîsê leşkerî) çûyin. Li ser rê dûkanekê. «Ezê cixara xwe agir kirn.» Di dikanê de. Dikancî. Rûyekf nas. Nêrîna çavan. Dikancî Ihsan Nûrî Beg dinase! Berî çend salan, di zivistanekê de, dîsan, li Xoyê. Ihsan Nûrî Beg û hevalên wî yên zabît, Rasfm û Tewfîq. Hingê navên wan sirrî û nerast bûn. Navê Ihsan Nûrî Begê Hacî Mihemed bû. Hingê ew diçûn û dihatin vê dikanê. Niha dîsan eynî dikan û eynî dikancî! «Hacî, bi xêr hatî! Hevalên te li ku ne?» Ew çi bibêje. Rewşeke xirab. Xirabf li ser xirabf. «Hacî kîye, hevalên min kîne?» Lê, dikanciyê f-nadkar!.. «Ez te rind nas dikim; hûn sê mirov bûn dihatin dikana min.»
Bi dû lavan û xeberdaneke dirêj re, ji dikanê derketin. Ihsan Nûrf Beg û leşker. Bi hev re. Li ser riya Tehwflê Dijban. Fikir û guman. «Min mirov şandiye Yaşar

bfne, evana ez girtime, min nas nakin, heke bêjim jf 'Ihsan Nûrî me' bawer nakin û mimkin e bidim Tirkiyê...» Bêhêvîtî. Bi serê xwe. Dayira leşkerî. Ketina hundir. Çend dua. Ji devê Ihsan Nûrî Begê. Melayekî Agiriyî Ihsan Nûrî Beg hînî duana kirine. Sedern; «çaxa diçî cem mezinek pisiyader, ev duan li serê wan bixwîne, bikeve hundir, her çi bixwazî qebûl dike.» Reyisê dayirê. Li hevûdu nihêrîn. «Tu kî yî?»
«Xulamê Yûsif Ebdal Axa me.»
«Navê te çi ye?»
«Wezo!»
«Çira hatiy Xoy?»
«Saeta zîvî ya Axa kar nedikir, min anî da saetsaz ku çê ke.»
Dîsan, bi qasî kêlîkê li hevûdu nihêrîn. Bi fikir û
144

guman. Bi şik û tirs. U bi hêvî.
«Here zû saetê bigir û bizivire!»
Kêfxweşî û şadî. Bîhngirtin. Rehetiyeke boş. «Xwedê îcar jf ez xelas kirim!»
Bi dû çend rojan re jî Yaşar Xanim tê. Li ser hespekê. Serbilind, rûken û kêfxweş. Evîndar, di dawiya dawîn de, digihên hev, hevûdu hembêz dikin û Ihsan Nûrî Beg xêrhatin lê dike. U tirk jî, bi awayê xwe, xêrhatin lê dikin; hê heftekê li ser hatina wê re nebihuriye, balafirên tirk li asmanên Agiriyê dixuyin û bi agirê mitralyozan ew gulebaran dikin.

Niha, di vê şikefta tarî de, gava Ihsan Nûrî Beg behsa wan rojên bi tirs dike, ew her sê dikenin. Ew roj jî, êdî, bûne xatirayeke tenik ji xatiran. Hevalên hevyênjiyanê, Ihsan Nûrî Beg û Yaşar Xanim li hev dinihêrin û bi xatirayên xwe dikenin.
Memduh Selîm Beg? Hevala wî ya jiyanê?
«Memduh Beg, tu behsa destgirtiya xwe nakî... çima?»
Yaşar Xanim dipirse. Gava ew li Helebê bû, wê bihîstibû ku Memduh Selîm Beg dike bi keçikeke çerkez re bizewice.
«Ez çi bibêjim?.. Bi xêr, gava ez vegerim, em'ê bi hev re bizewicin.»
Gotineke bi ken. Bi şerm. Hêdî. Ji çaya germ ya ku Yaşar Xanimê çêkiriye, çend qult vexwarin û bêdeng li keçika pordirêj fikirîn.
«Memduh Beg, Yaşar Xanimê bihîstiye... destgirtiya te pir delal e... û tiştekî ku bala min dikişîne... Çima munewerên kurdan keçên çerkez mahr dikin?.. Tu divê pê bizanibî.»
«Na, mîrê min, ez pê nizanim...»
Rast, çima bi keçikeke çerkez re? Siûs, qeder. Ne tiş-
145

tekî din. Bi tenê siûd. Xezalê ne çerkez bûya jî, ew xezaleke bedew bû. Memduh Selîm dê, dîsan, bi taya evînê biketa.
Lê digel vê hindê jî, hin tiştên ku qewimîne, lê niha,

bi zehmetî bi bîr tên. Mesela çîroka wê kitêbokê... Sal 1914, destpêka şerê cîhanê. Memduh Selîm Beg li kitêbxanên Stembolê digere. Di kitêbxaneyeke Beyoglu de kitêbokekê; Osmanli Alem-i Ictimaiyesinde Çerkes Kadinlari. Yanê, Jinên çerkez Di Civata Giştî Ya Osmanî de... Bi tirkî. Bi tenê 63 rûpel. Ji aliyê Mehmet Fitkerî Şûenû nivisandî. Kitêbeke hûr li ser jinên milletekî hûr. Kitêbokeke balkêş. Lê Memduh Selîm Beg pere tune ku wê bikire. Bêgavî. Dermana bêgaviyê ; dizî. Bi hêdîka. Bi hezr û dîqet.

Kitêbok; hawara niviskarekf çerkez. Gazinc li qedera reş ya jinên çerkez kirin. Wesf û salixdana wan. Bi hênceta jinan li bfr û baweriyên çerkeziyê vegerîn. «Bu bir hazan-i milliyedir...» Nivîskar diqîre û weha dibêje;ev qîrîneke neteweyî ye. U çend tiştên din ji kitêbokê ku niha, bi zehmetî tên bîra Memduh Selîm Begê; «keçên bedew yên çerkezan ku di 365 rojan de bi tenê sê sed peyv bi kar tînin,.. saffiyet-i ahlakiye û neshyye-i pak... jinên bi hî, edeb, bi vîjdan û dilovan...»

Li milê din, ew keçika biçûk ya kulîlkfiroş?.. Sersal. Şeva berfîn. Galata. Ew şev û ew keçik jî niha tên bîra Memduh Selîm Begê.

«Ihsan Beg, mîrê min... dilên bindest zû bi hev dihesin û ji hevûdu fahm dikin. Heye ku ev jî sebebek e ku kurd û çerkez bi hev re dizewicin...»

7

Çiyayê mezin Agirî. Di nav ewr û asmanan de. Bi kumekî spî ji berfê. Delaliyê efsane û dastanan. Efsa-

newî. Çiyayekî xweş û spehî. Mezinahiyeke bêpîvan. Agirî... Yanê Ararat. Yanê Kuhî Nuh, bi farisî Çiyayê Nuh. Yanê Masis, bi ermenî. Yanê Cebel el Haris, bi erebî. Agirî, warê keştiya herî kevnare ya merivahiyê. Di Tewratê de weha dinivisf; « U keştî di meha heftan, hufdeyê mehê de li ser çiyayên Araratê sekinî...» Agirî... lawê Huriyan, mezinê Urartuyan û bapîrê kurd û ermenan. Ziyaretgahê Zerdeştiyan. çiyayê evîn û agirperweran.

Agiriyê mezin. Li nik wî jî Agiriyê biçûk. Tendûrek. Xwişka Agiriyê mezin. Li spêdê wî de cîhekî wekf tenûr heye ku jê hilmeke germ radibe. Şîfagehê kurdan. U niha jî şahîdê şerekî dijwar.

Havîn, 1930. Lehî û çemên Agiriyê, bi awakî boş, diherikin. Xwîn bi awakî boş diherike. Şer germ e. Her roj, her saet. Kurd hilkişiyane bilindahiyên çiyê û di zozanan de kon vedane. Ew ji germa tavê, mêş û kelmêşan bi dûr ketine.

Dewleta tirk 120 hezar leşker civandiye navçê. Edî aşkere ye ku ew nikarin kurdan bixapînin. Niha wan dil heye serîhildanê bifetisînin. Ew bi balafir, tanq, top û leşker êrîş dibin ser kurdan. Kurd jf êrîş dibin ser wan. Li her alî şer, kuştin û mirin.

Memduh Selîm Beg?

Ew hê jî li Agiriyê, li nik şervanan e. Çûyin tune. Rê girtî ne. Li milekî şer gur bûye û li milê din jîxebata

dîplomatîk ya Turkiyê. Agirî û kurd di navbera tixû-
bên Iran, Yekitiya Sowyet û Turkiyê de rojên dijwar
dijîn. Turkiyê hukimeta Sowyetê ber bi xwe kişandiye.
Hukimeta Sowyetê alîkarî li serîhildanê nake û deriyên
xwe ji şervanan re girtiye. Turkiye, niha jî, bi hukimeta
Iranê re dipeyive. Hem li Ankarê û hem jî li Tehranê.
Tirk dixwazin Iranê jî ber bi xwe bikişînin. Iran jî niha
147

bi şik h serîhildanê dinihêre. Dewleta Yekitiya Sowye-
tê gelek leşker li ser tixûb, li hember tixûbên Turkiye û
Iranê civandiye. Dewleta Iranê hemû navça Makoyê bi
leşker tijf kiriye.
U tiştekî din; Memduh Selîm Beg naxwaze şervanan
weha di nav vî şerê germ de bihêle û here. Nabe. Ew ni-
kare here. Lê ew name dinivîse. Bi hêviya ku name bi-
gihên cîhê xwe.
Kurd êrîş dibin ser taximên leşkerî yên tirk û wan
dişikînin. Manewiyat xurt e. Bawerî wekî spêdê Agiri-
yê ye. Ji şerkariya wan re payan tune. Lê, digel vê ye-
kê, weha nabe. Şer divê firehtir bibe. Naxwe, serîhil-
dan dê bixeniqe. Çend eniyên din jî divê vebin. Geliyê
Zîlan û Çiyayê Sîpanê. Du şergeh û navendên din. Çi-
yayên bilind, eşîrên xurt û welatperwer. Navçeyên asê.
Li wan deran jî alaya rengîn hildan û tovên serîhildanê
çandin divê. Civfneke çend rojan. Bi serokên Geliyê Zî-
lan û Heyderiyan re. U fermaneke dirêj. Ji aliyê ku-
mandarê hêzên çekdar yên kurd Ihsan Nûrî. Li ser ka-

xizeke Xoybûnê.
1- Neyar 11 juen 1930 êrîş aniye ser Agrî, Qabaq Tepe, li quncê bakurê rojavayê Agrî dagir kiriye û cî-bicî bûye. Şeş firokeyên neyar di vê pelamarê de hev-karî kirine. Di rojên 11 heta 18 juen tenê frokeyên ne-yar li serê Agrî difiriyan, bom davêtin. Sê froke ji aliyê hêzên Agrî lêdan e û yek ji wan frokan li meydana fro-keyî ya Bayzîdê ketiye xwarê, frokevan miriye.
2- Desteyên gerok ên Agrî êrîş û pelamara xwe bi ser bingeyên neyar ku li dor û berê Agrî da ne dest pê di-kin.
Bi liqê naverastî ferman dane ku hêzên xwe bişînin çiyayê Tendûrek, pêşiya karwanê bar û benê hateçû-yên neyar bigirin. Qolordiyek tirk ku bi mebesta êrîş-
148

kirina ser Agrîji nîvroyê rojavayê Anadolê bi rê ketiye, li ber helsoran û pêkbûna mezin a me li malbendên nîvro yên Sûriye û Dersim û Xarpûtê neqediyaye pêş de were.
3- Hevirgeyê yekem ê pêkanîna Xoybûn: bi arîkariya Xwedayê mezin, êrîşê ser hêzên Tirkiyê bike.
a- Qomandarê giştî yê jandermeriya Agriyê Temir A-xa, bi hêzên ku li bin destê wî datînin li bervarê 3 juiye 1930, bi arîkariya xêlê xwe şemkan ku li malbenda Qolpê rûdinin, êrîş dide ser navenda qezaya Qolpê, paş dagirkirina bajêr pêşmergeyan heya girtina gundê Per-navot berepêş bişîne.

b- Şeva 4 juiye qomandarê qorxan serheng Velî Beg ji eşîrên Gizkan û Zflan hêz bigire, bi pelamarek nişke-va bajarê Ixdir dagir ke. Her di vê rojê de hêzên Agrî ê-rîş dibin ser postên neyar li dor û berên Agrî.
4- Serokên eşfrên ku li nav gundê Deren kom bûbûn, hêzên wan roja înê, 4 juiye, hêzên tirk ên ku li navçeya wan hene rikêb kin, îdareya navçeyê bi dest bigirin, bi ev çeşnê ku li xwarê dinivfsim bi kar bînin.
a- Liqê Ercîş ji Geliyê Zîlan yarmetiyê digire paşda-malina îdareya hikûmet bi aliyê Adilcewaz diçe, pey dagirkirina vî bajarî xeta jor a Çiyayê Sîpan digire, gi-rên nîvroyê Adilcewazê digire û bi aliyê Axlat û Tat-wan û Çiyayê Nemrûd desteyên siwar dişîne.
Serokê Geliyê Zîlan: pey dîlgirtin û bêçekkirina hê-zên tirk li malbenda xwe rojavayê Çiyayê Aladax bigi-re, bi aliyê Melazgirt desteyên siwarf bi hêz bişîne ji bo yarmetiya êla Hesenan rêyên Qere Kosê(Tirka îro navê bajêrê Qere Kosê Agrî danîne!) û rêyên Melazgirt, Pat-nas, Ercîşê bigire!
c- Eşayirên Heyderî ku li malbenda Patnosê rûdinin û ji xêla Melazgirt wan ên ku tev pêkbûna me ne ; baja-
149

rê Patnosê dagir bikin, girên bakur û rojavayê Sîpanê bigirin, aliyên Çiyayê Nemrûd, Mûş û Kopê desteyên siwarî bişînin, bixebitin hateçûyên neyar bizanin!
d- Liqê bargirf: navenda bargirî û Ernisê dagir ke, rê-yên ji aliyên Wan, Ercîş û Seray têş bibende!

e- Liqên naverast bi yarmetiya xêlên Celalî, Mîlan û li gel eşayirên ku di alega de rûdinin û tevî yekbûna min navenda Bayzîd-Agrî dagirt, sê sed çekdar bi Çiyayê Tendûrek şand ji bo ku hêzên din ên şerkarên Bargirî bihêztir ke, ji bona tirsandina Wan û Serayê bixebite, ji aliyên Wan, Tarp, Seray, Başqele û Hekarê zanînê bi dest bfne, xeber bide!
f- Liqên Ercîşê: çi qas dikare bi liqê naverast yarmetî bide!
g- Reîsê xêla Adaman Qaymeqam Hezretî Ibrahîm Axa bi zûtirîş kat li gel Elî Begê Mîrza Axa û Resûl Begê Zilî û serokên eşîretên Qotan û Hesesorî gotûbêj bike h gel van eşayir, h ber warê 4 juiye 1930 roja înê êrîş bikin ser bajarê Diyadînê, rêya Qere Kose-Bayzîdê bi temamî hildewşînin, bi taybetî hêz û xebatên neyar li Qere Kosê bi tevahî berewurd bikin, bi desthênana çend û çûna li gel Hemîd Beg têbikoşin, rêya hateçûnê li neqeba Tahir bixin metirsiyê!
h- Paş dagirkirina van ciyên ku min diyar kirine, liqên Ercîş, Patnos û Geliyê Zîlan beşa zor a hêzên xwe li pişta xeta Dutax-Melazgirdê, liqê Bargirê tevahiya hêzên xwe li Ernis-Norşatê kom bikin!
5- Şûna fermandeha giştî li Agrî ye; paş diyarbûna wez'ê şer vê ciyê re xeber bidin!»
Fermaneke dirêj û bi rêk û pêk. Hêviya dawîn ya biserxistin û firehkirina serîhildanê. Gava esasî. Fermaneke tarîxî h ser riya tarîxê.
Kurd tarîxa xwe, bi xwîna xwe, dinivisînin.

8

Evar. Di bin ronahiya stêrkan de straneke zîz. Li nik konên vegirtî. Li ser zozanan. Ew, dengbêjê hezar salan. Stran, dengê milletekî kevnar. Di nav şer de musîk. Dastana Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê. «Cembeliyê Hekkarê hebû, li çiyayê Hekkêr bû, reîsê hezar û pênc sed xortê herdemlawîn bû. Pir axakî baş bû; du jinê wî hebûn bi kêrî şixolê malê û mêvana nedihatin. Aşiq Hemo hebû, ew jî stranvanê Cembelî bû, hema xortekî spehî bû Aşiq Hemo, kêf ji Cembelî re dikir...»

Memduh Selîm Beg û dengbêj. Wî jê tika kiriye. Dengbêj hêdî hêdî dibêje. Pêşî wekî çîrok, paşê jî wekî stran. Ew jî lê guhdarî dike. Musîk; dastanên kevn, kemançe, resîtal û konçertoyên nûjen. Dengê musîkê. Dengekî ji wan çar dengên ku Memduh Selîm Beg jê hez dike. Dengê musîkê dermana kul û birînên dilê wî ye. Dengê musîkê wî vedijîne, zînde dike, deriyê dil û ruhê wî vedike. Dengê musîkê jî, wekî dengê spêdê Agiriyê, abadîn, yekta û xurt e. Meriv pê re dere, sermest dibe, dikeve nav cîhanên rengîn û ji kahniyên hûnik ava evînê dadiqultîne. Dengê musîkê hez û coşeke mezin dide wî. U tiştê balkêş, herçend stran û dastanên kevn kêfxweşî didin Memduh Selîm Begê, ewçend jî musîka nûjen kêfxweşî didiyê. Bi qasî dastana Binevşa Narîn, musîka Yvette Gilberts û Eric Satie jî dilê wîbi

firê dixe. Ew ji dengê vî dengbêjê kal jî hez dike, ji dengê kemança Xezalê jî. Li gor wî, stranên eşîran û musîka salonan hevûdu temam dikin. Ew mîna hev in û her du jî kêfxweşî didin. Bê guman, her yek bi awayê xwe.
Xwezî ew jî bibûya aşiqekî eşîran! Wekî aşiq Hemo yê Cembelî. Ew jî di nav eşîrên koçer de bigeriya, we-
151

kî wan rabûya û rûnişta, bistra, deng bida edet û torên kevnare. Lê siûd!
«Hezar mixabin ku ez baş bi zimanê xwe nizanim û hê di xortiya xwe de ji welatê xwe bi dûr ketim û bi tirkî perwerde bûm.»
Dîsan lîstikên siûdê...
Bîhneke xweş ji axa nûvejiyayî radibe. Bîhna axê, bîhna dar û kulîlkan û bfhna çiyayê serbilind ketine nav hev. Li her alî, şervanên westiyayî, peregende, li ber konên xwe rûniştine û bi hev re dipeyivin. Şev hêdî hêdî dadikeve. Stêrk diçirûsin. Ji derine dûr, dengê tifingan tê. Li nik Memduh Selfm Beg jî dengbêjekî kal dastaneke kevn, bi dengê xwe yê melûl, tîne zimên...
Yarebiyo! Ev çi dinya ye! Efsane, dastan, stran, şîîr, sewda, evîn, şer, mirin, kuştin, dijminahî... her tişt, her tişt ketiye nav hev...
Memduh Selîm Beg, guh li ser stranê, li nik dengbêj, li ser axa nerm dirêj bûye û li stêrkan dinihêre. Ev dastana kevn, ev stêrkên bêdeng, ev axa nerm... Eger haya

yekî ji şerê malkambax nebûya û niha bihata vê derê, wî dê bawer bikira ku ew hatiye bihuştê. Stêrk dilîzin. Tirmê Mexilan, ew heft stêrkên stûr û ronî asman dineqişînin. Stêrka Qurux li spêdê Agira mezin dibişire. U Leyl û Mecnûn, ew her du stêrkên stûxwar jî li hev dinihêrin. Yek li rojhelat, ya din li rojava.
Cembeliyê Hekkarê û Binevşa Narîn. Leyl û Mecnûn...
«Xwediyo... Çima ev eziyet? Ma ev stêrên stûxwar dê tu carî negihên hevûdu?..»
9
Ji kêfa Ruhistîn re payan tune. Wî konê xwe di navbera çiyayên Agirî û Tendûrek de vegirtiye û kêf dike.
152

Şûrê wî, bêrawestan, dişixule. Her gav. Li her derê Agiriyê. Meriv dikevin. Xwîn dirêje. Birîn vedibin û Agirî, ev çiyayê serîbilind, reş girêdide.
Karwana mirinê ketiye rê. Di rêberiya Ruhistîn de. Ruhistîn rûyê xwe yê bi xof nfşan dide. Mirin, wekî qirdekî, dikene û dikene. Havîna 1930 an bi xwînê tê avdan. Agirî xwîn dirijîne, xwîn digirf, xwîn vedirişe. Dewleta tirk bi hemû quwetên xwe tê ser Agiriyê. 60 hezar piyade, deh batarî top, pênc sed û pênce mitralyoz û pênce balafirên şer. Serokê hêzên tirk qumandarekî navdar e; Salih Paşa. Kurd jî li ber xwe didin. Bi îmkan, çek û cebirxanên kêm. Roja 11 hezîranê. Roja êrîşa tirkan ya herî mezin. Rojeke xedar. Daweta Ru-

histîn. Şer. Ordiya tirk dil dike ku warên kurdan rapê-
çe. Kurd dil dikin ku Agiriyê biparêzin û hêzên ku li
pey ordiya tirk mane, ji paşiyê werin û li tirkan xînin.
Ji Deyadîn, Tendûrek, Patnos, Ala Dax, Sîpan û Zîla-
nê.
Qiyamet radibe. Erd dinale, çiya digure. Rawir û teyr
direvin. Dengê leşker û şervanan hawirdor digire.
20 'ê hezfranê tirk şikest dixwin. Ew bi şûn de dire-
vin. Tevf xesareteke mezin. Mirî, birîndar, dîl, çek û
cebirxanên h cîh hîştî, pênc balafirên xistî. Kurd di-
kevin pey wan û wan ji gundan bi dûr dixînin. Lê tirk
nahewin. Ew, car bi car, bi balafiran gund, cîh û warên
kurdan bombebaran dikin. Balafir, ref bi ref, tên û
bombeyên xwe berdidin ser kurdan û dîsan vedigerin.
Kon û xanî hildiweşin. Ji her alî bîhna barûtê tê. He-
valjina Ihsan Nûrî Begê Yaşar Xanim birîndar e. Diya
Biro Heskî Paşa mirî ye, bombayekê li ber pîrejina sed
û deh salî diteqe û wê hûr dike. Kurdan xwe spartiye
çeper, kozik, qelaş û şikeftên çiyê.
Memduh Selîm Beg tênagihê ka ew di nav vê agir û
153

xwînê de çawan dijî. Wext pir bi lez diherike. Meriv
tên nik wî. Kom bi kom. Ew direve vê derê û wê derê.
Ji bo alîkariyê. Ew rûdine name û belavok dinivîse. Bi
kurtebirî; di van rojên xedar û giran de wext lê kêm
bûye.
Niha jî, ew di şikefta birîndaran de, li nik birîndaran

e. Birîndar di şikefta tarî de, li ser ka û pûşê raxistî, qor bi qor, dirêj bûne. Bergeheke nexweş. Serî, stû, sîng, çîp, pî, ling, zikên pêçayî. Keser, axîn, nalîn. Daxwaza av û dermanê. Daxwaza mirinê.
Memduh Selîm Begê çi divê? Ew li nik birîndarekî ye. Birfna birîndar pir xedar e. Zik qelişiye. Hûr û rûvî li derve ne. Zik bi libasekî spî pêçayî ye. Serê birîndar li ser cogê Memduh Selîm Begê ye. Xortekî çeleng. Simbêlbadayî. Rû û enî di nav xwînê de. Memduh Selîm Beg, bi destmalekê, rû û eniya wî paqij dike. Şervanê xort li ber xwe tiştina dibêje. Tiştine ku fahm nabin. Dengê wî ji deng bêtir xirexir e.
Memduh Selîm Beg çi bike, çi dikare bike?.. Bijîşk, nexweşxane, derman tune. Hacet û firaxên tenduristiyê tune. U li ber çavên wî jî, xortekî nûgihiştî li ber mirinê ye. Mirin rûyê xwe yê kirêt nîşan dide. Kincên li ser şervan lîme-lîme ne. Bîhneke giran ya barût, titûn, xwîn, ax û xwîdanê ketiye ser wî. Pêlavên çerm yên h lingan jî bûne qul-qulî. Şervan hay ji Memduh Selîm Begê tune. Li milekî ew xwîdan dide û li milê din jî diricife. Bîhn lê çikiyaye. Rûyê wî vedikişe, carina axîn dikişîne, carina jî dinale. Memduh Selîm Beg, hêdî hêdî, xwîdana li ser rû û enî paqij dike û bi dû re jî, destê xwe dirêjî milê wîdike. «Xorto!.. birayê hêja, li ber xwe bide, tu'ê zora birînê bibî...» Xort çavên xwe vedike, pêşî li destên Memduh Selîm Begê, paşê jî h rûyê wî dinihêre. Çavên wî yên stûr û reş westiyayî

ne. Eşa xedar û tirsa mirinê li ser çavan dixuyin. Hinarik û gumên wî sor bûne. Wekî ku ew dişewitin. Lêv jî terikîne, bûne reş û zuha.
«Xîret xorto, xîret...»
Şervan careke din h Memduh Selîm Begê dinihêre. Ken. Ken li ser rûyê Memduh Selîm Begê. Ew bi nêrîna şervan kêfxweş dibe. Şervan wî dibihîse. Niha, xort dixwaze tiştekî bibêje. Lê tiştê ku ew dibêje, fahm nabe. Dengekî tenik û şikestî jê derdikeve. Dengekîêştijî. Ew diricife. Di vê havîn û şikefta germ de, ew bi tayê ketiye. Bêyî ku Memduh Selîm Beg xwe bilivîne, ew bi hêdîka, çaketê li ser xwe ji xwe dike û davêje ser şervanê xort. Şervan jî, wekî ku pê qayil be, xwe dihvîne. Hingê ji devê wî tiştekî ku fahm dibe, derdikeve:
«Ax li min... Xwedeyo!»
Lê, piştî bîskekê, ew dîsan diheze û xirexir pê dikeve. Deng tê birîn. Lêvên wî, bi lez, dilivin. Bedena wî çend car, pihêt, vedikişe û diheze. U paşê... paşê jîew bêhereket dimîne. Ew di bihara umrê xwe de ji dinya şer û pêveçûnê xatir dixwaze û dimire. Ruhistîn bi ser dikeve. Careke din. Bi bêbextî. Bi neheqî...
Mirin. Rûyê mirinê. Ev mirina rûreş çi ye? Çima ew weha bêwext û bêwar tê? Çima ew dê were û li qefesa singa xortekî weha rûne? Ev bedena ciwan û germ, niha, piştî çend deqîqan, bû meyit. Sar, bêruh, bêhereket. Ev çi ye?.. Du hêstir, wekî libên lûlûyan, ji çavên Memduh Selîm Begê ber bi jêr dibin. Ew porê şervanê

xort mist dide û digirî.
10
Xewn.
Di xewnê de du kes. Kalemêrekî rîhspî û zarokekî biçûk.
155

Ji wan du kesan pê ve, goristanekê. Di xewna tariya şevê de goristaneke fireh wekî deryakê. Li dor goristanê darên têkel û stûr. U gor. Qor bi qor. Têkel. Mezin, biçûk. Nû, kevn. Xweşlêkirî, xirbe.
Ew di goristanê de dimeşin.
«Kalo, çima em hatin vira?..»
«Memduhê min, çavreşê min... bav û kalên me li vê derê dinivin. Ev cîh warê me yê ebedî ye. Piştî ecelê em tên vê derê, nik mezin û qedirgirên xwe...»
«Kalo ecel çi ye?..»
Kalo dikene, neviyê xwe hembêz dike û dikene.
Dinya hûnik e. Hawirdor di nav hêşinahiyeke bedew de ye. Çivîk li ser daran difirin û vîçevîç dikin. Ji dûr ve kewroşk dixuyin û winda dibin. Goristan xweş û rengîn e.
«Memduhê min, goristana Wanê, yanê ev goristan yekta ye. Ev cîh hem xweş e û hem jîji bo xewa ebedî wekî cennet e...»
«Kalo... xewa ebedî çi ye, kengê meriv dikeve vê xewê?»
Ecel, xewa dawîn, goristan û zarokekî biçûk.

«Kalo, heyra Kalo... ev der xweş e, min jê hez kir, em ji vir nerin...»
Destê biçûk di nav destê Kalo de ye. Ew bi hev re derin, di nav qebr û goran de digerin. Hêdî hêdî. Li dor wan, li ser goran kesine dixuyin. Kesine ku hatine serîlêdana miriyên xwe.
Bîhneke xweş. Bîhna hêşinahî, gul, kulîlk, dar, axa nerm û goran. Bîhna goristanê. Li dor goran gul û kulîlk. Reng bi reng. Kêfa lawikê biçûk di dewsê de ye.
«Kalo, ev însan çi dikin? Çima ev li ber wan mezelan rûniştine?»
Kalo jê re dibêje. Hêdî hêdî. Bi zimanekî xweş û
156

nerm. Bi zimanekî ku lawikê biçûk dikare têbigihê.
Li ber wan, li aliyê rastê çend jin. Ew li ber gorekê rûniştine. Di destên wan de kitêbine hene. Ji yekî pê ve, yên din hemû di nav kincên reş de ne. Ji yekî pê ve, yên din hemû serîgirtî ne. Ew yeka hanê jî di nav kincên spî de ye. Kincekî tenik û tûlîn lê ye. Ew serîvekirî û pordirêj e. Porê wê jî zer, rûyê wê spî wekî dilopeke şîr û bedew e.
«Kalo, ev jin çi dikin? Ev kî ne?..»
«Ez nizanim çavreşê min.»
Kalo û zarok riya xwe diguherînin û ber bi jinan dibin. Jin jî vedigerin û h wan dinihêrin. Li ser rûyê jinan tu tişt naxuye. Lê jina porzer li wan dinihêre û dibişire. Mîna ku ew wan dinase. Nêrfna jinikê germ e. Ka-

lemêr û zarok jî lê dinihêrin û dibişirin. Kalemêr û zarok ber bi wan dilezînin.
Lê ji nişkekê ve tiştekî diqewime. Berî ku kalemêr û zarok xwe bigihînin wan, balafirine ji asmên dixuyin. Balafirine kesk yên leşkerî. Dengê balafiran. Her kes vediciniqe. Çi dibe?.. Balafir li ser goristanê difirin û bombe berdidin ser goristanê. Bombe diteqin. Ji axê toz û dûman radibe. Şênî belav dibe. Her kes ber bi alîkî direve. Koma jinan jf belav dibe. Ew direvin. Jina ku kincên spî lê ye, direve ku xwe bigihîne bin darekî. Jinên din ber bi milê bervajiyê direvin. Bombeyekê, bi dengekî pir bihnd, di navenda wan de diteqe. Her yek ber bi alîkî dipengizin. Qîrfn û hawar. Lê kî dê were alîkariyê?..
Kalemêr û lawikê biçûk jî ber bi aliyê jina kincspî direvin. Diyar e, wan jî dil heye ku xwe bigihînin bin eynî darê. Lê nabe. Bombeyekê li ber wan diteqe. Kalemêr ber bi milekî, lawikê biçûk jî ber milekî din difîrin. Axîn. Qîrfn. Dengekî zîz. Barût. U tiştekîgerm û
157

ron. Xwîn. Nefesa lêwik tê birîn. Bîhna wî diçike. Çav lê giran dibin.
Mirin û Ruhistîn rûyê xwe nîşanî lawikê biçûk dide. Di goristana xweşik û rengîn de Ruhistîn li dor lêwik digere.
Di xewna Memduh Selîm Begê de mirin, ecel, Ruhistîn govend digirin...

11
Ihsan Nûrî Paşa, Biro Heskî Paşa, qumandarê cendirman yê wîlayeta Agiriyê Temir Axa, qeymeqamê Korhonê Mele Husên, berpirsiyarê nehiya Ortîlî Hesen Efendî, berpirsiyarê nehiya Korî Musa Axayê Berkî, qumandarên kurd Ferzende Begê Hesenanî, Xalit û Nadîr Began, Demir Paşa, Emîn Paşa, Mamoyê Heyderanî, Seyid Resûl û Husên Axa û niwênerên partiya ermenî Taşnaqê, gelek qumandar, serok û berpirsiyarên din yên hêzên kurdan. U Memduh Selîm Beg.
Rojev; em çi bikin?
Ordiya tirkan êrîş dibe ser gundên doralî, gund dikin kavil û xirbe û rûniştevanên gundan dikujin. Ew bi vî awayî tola xwe ji hêzên leşkerî yên kurdan hiltînin. Heta niha, li doraliyê Agiriyê sed û sîh û li doraliyê Zîlanê jî bi qasî du sed gund hatine şewitandin. U hejmara kuştiyan jî li ser deh hezarî ye. Deh hezar zarok, jin, kal û pîr. U bi hezaran gundf jî ber bi Anatoliyê hatine koçkirin.
U tiştekî din; dewletên tirk û îranî li hev hatine. Dewleta tirk li dorahyê Wanê hin erd dane Iranê da ku ew bikaribin li hev bikin. Li gor vê peymanê, êdî tirk dikarin niha bikevin erdê Iranê û ji paşte werin û li hêzên kurdan xînin. Iran hew rê dide kurdan. Tixûb li wan hatiye girtin. Ordiya tirk dor li wan girtiye. Ji der-
158

tu alîkarî nayê. Xwarin, zexîre û terzad li ber qe-

ve
dandinê ne. Cebirxane vala dibe. Birîndar yek bi yek dimirin. Zar û zêç birçî ne.
Çi dive?
Pêşniyara niwênerê Taşnaqê; «heke ta 24 saetan em ji Agrî dernekevin, hemû hemû bi destê tirkan dikevin...»
Yanê pêşniya valakirina Agiriyê. Kurd li hev dinihêrin. Çawan dibe! Evzehmetî, dijwarî, şer, mirin û kuştin ji bo vê yekê bû? Çawan alaya rengîn ya serbestîû azadiyê dakeve? Çawan ew dîlbûn û bindestiyê, ji nû ve, qebûl bikin? Na, weha nabe. Evçend sivik û erzan nabe. Dijmin dê nikaribe, zû bi zû û evçend erzan, navenda şoreşê vegire.
Ihsan Nûrî, tilî li ser simbêlê badayî, hêdî hêdî, bi dengekî zîz dipeyive.
«Rast e, di nav ev deryaya neyar de nexeniqîn dijwar e, belam em kurd in, ji gemarobûn natirsin. Her an dil bikin û gemaro çiqas tengtir û zortir be jî dikarin wê bişkênin. Ji xwe em naxwazin ji Agrî derkevin!..»
Gotina daxwaza dilê kurdan. Şer divê, heta dawîn şer divê. Lê niwênerên Taşnaqê li ser pêşniyara xwe israr dikin. «Qe nebe, fermandarê kurd nefsa xwe li gel xanima xwe ji Agrî derkeve...»
«Ev pêşniyara te ji bo gotin nahêj e: ez ji bona jiyana şexsê xwe ji azadiya netewî dest nakêşim, giyanê min ezîztir ji hevalên min, ji ev qaremanan nîne, jiyan û mirina min yek e, ez tu car ji wan naqetim! Heke teqdîr be, em tevî hev dimirin! Tu bi xwe dibînî, sî-çil hezar

hêzên neyar dor li me girtine, li pêşiya yek pêşmergê me ji sed û pêncî esker kêmtir nîne, hê helqeya gemaro bi temamî li dora Agrî nekêşane, hêzên tirkan ku teze hatine Serdar Bulaxê, îşev nikarin aliyên xwe qors bi-
159

kin, ji vê derfetê kelk bigirin, şarezayên xwe jîhildin, î-şev ji Agiriyê derkevin!..»
Gotina Ihsan Nûrî ya dawîn. Kurd Agiriyê naterikî-nin. Ihsan Nûrî Agiriyê naterikfne. Ew dê li ber xwe bidin û şer bikin. Lê niwênerên Taşnaqê dikarin herin.
Memduh Selîm Beg?
«Iskender Beg jî dikare bi we re here.»
«Na, mîrê min, ez naxwazim... Ez dê we li vê derê bihêhm û herim!.. Na, na, nabe. Ez dimînim.»
«Birayê Iskender, êdî tiştekî ku tu li vê derê bikaribî bikî, nema... Çêtir e ku tu herî û hal û hewalê me ji dinyê re bidî zanîn...»
«Na, mîrê min, na... nabe, welle nabe, ez'ê li nik we bimînim.
12
Nîvê şevê. Her der tarî. Heyv çûye ava. Stêrk li spê-dên çiyayên Agiriya mezin û biçûk dilîzin. Ji dûr dengê wawîk û çeqelan tê. Şeva avis li ber welidanê ye. Piş-tî niha bi bîskekê, rojeke nû dê bizê.
Lê berî ku roj bizê, divê hin tişt bi ser kevin. Di na-venda qumandariya hêzên kurdan de lebateke bêdeng. Çûyin û hatin. Hazirî. Haziriya terkkirinê. Pênc ermen

û Memduh Selîm Beg warê serîhildanê û navenda qumandariyê terk dikin. Tevî çend şervanan. Ew dê herin. Bi hêviya ku ew riyekê bibînin û xwe bigihînin Iranê.
«Mîrê min, ev neheqî ye... Hûn neheqî h min dikin. Hûn min bi zor dişînin...»
Iskender Beg, weha çêtir e. Tu bawerî bi qisê min bîne. Weha, ji bo me hemûyan, çêtir e...»
Xatirxwestin. Hevûdu hembêzkirin. Gotinên xweş yên dawîn. Ken. Qumandarên hêzên kurd. Yek bi yek.
160

Merivên jêhatî, xurt, bîrewer û fedakar. U serfiraz; ji bo welatê xwe çekhildayî. Rûyên wan yên bi ken. Bi bawerî, dilsozî û dilovanî li Memduh Selîm Begê nihêrin.
«Heyra... li xwe binihêrin... Bila tiştekî bi we nebe. Hûn qehremanên vî milletê belengaz in. Hûn hêviya me ne. Ezbenî, bila tiştekî bi we nebe...»
Yaşar Xanim. Hevaljina dilsoz. Jina xurt û bedew.
Ew jî li nik mêrê xwe, Ihsan Nûrî dimîne.
«Yaşar hanim, bari siz de bizimle gelseydiniz?..»
Memduh Selîm Beg jê, bi tirkî, tika dike ku ewjîbi wan re here. Lê belê, na. Ew naxwaze. «Her meteris be, Ihsan Nûrî hebe ez jî hevbeş im, qet di nav agir de nahêlim, xwe xelas nakim, hûn herin, Xwedê yarê we be!..»
Ew jî nayê. Tu kes nayê! Lê Memduh Selîm Beg divê

here, divê van merivan di nav agir de berde û here! Ew xelas be, ev jî di nav agir de bimînin!
Siûda xirab!
«Di xweşiyê de bimînin. Hûn bijîn. Hûn serfiraz bin. Ez derim... hûn min dişînin, lê dilê min bi we re ye, dilê min bi we re ye. Ez dê her h we bifikirim, saet, roj û mehan bihêjmêrim û li we bifikirim... Bi xatirê we...»
«Oxir be, Iskender Beg, oxir be...»
Oxira te ya xêrê be Memduh Selîm Beg.
161

ŞiKESTÎNA MÎRAZAN U WEXT

1
1931. Dawiya zivistanê. Ber bi êvarê. Bajarê kevnare, Antaqiye. Bajarê Memduh Selîm Begê.
Kolanên şil û vala. Mij. U Memduh Selîm Beg. Ew vegeriyaye. Edî şerê xopan li pey maye. Naxêr, şer li pey nemaye, lê Memduh Selîm Beg ew li pey xwe hîştiye. Ew ji agirê şer bi dûr ketiye. Agirê evînê, niha, dewsa agirê şer girtiye.
Ew li ser riya mala xwe ye. Ew, hêdî hêdî, di kolanên kevn û şil de, ber bi mala xwe dimeşe û li dor xwe dinihêre.
«Xwedeyo... Qederê!.. we weha h min kir. Ez dîsan hatime bajarê xwe... ez derim mala xwe... bajarê min, mala min... ev warê xerîb bûye yê min. Berî heşt salan

min welat, bajar û mala xwe li pey xwe hîştin û ez ha-
tim van deran. Niha jî ev der bûne warê min, bûne we-
lat, bajar û mala min... qederê, qederê...»
Xerîbf, hîsên xerîbiyê... Lê belê, ew. Digel xerîbiyê
ew heye. Yanê Ferîha. Xezalê... Edî wext hat. Payin û
payandin nabe. Keça reben evçend pa, evçend li hêviya
wî ma. Bi evîn. Bi axîn û nalîn. Digel ku her tişt li dijî
payinê bû. Niha, êdî wext wexta perûkirinê ye. Payin û
164

dilsoziya evînê divê perû be. Belê, êdî Memduh Selîm
Beg zewac divê. Zar û zêç divê. Dukesbûn, ducanbûn
divê. Jiyaneke ku her roj bi evînê tê avdan divê.
Ew dê, niha, here mala xwe, li mala reben û bêkes
binihêre, xwe bişo, gemariya mehan ji ser xwe bavêje,
xwe kur bike, kincên paqij li xwe bike û paşê jî berê
xwe bide mala bavê Xezalê. U ew dizane ka qisa wî ya
pêşin dê çi be:
«Li min bibuhirin ku ez weha bi derengî ketim. Li
min bibuhirin ku her tişt weha bi derengî ket. Lê niha,
êdî tu kesp û kosp neman. Em hema, bi carekê, zewac
û dawetê bi ser xînin. Iroj, sibê, dusibê... rojeke zûti-
rîn...»
Lê ew çi ye?
Do zarok. Kurekî û keçekê. Li kolana vala. Li ber
mala Memduh Selîm Begê. Deriyê mala wî jî vekiri-
ye. Zarok dilîzin, lotikan davêjin. Fîstanên h ser wan
heta çogan şil bûye. Baranê kolan şil kirine. U jinikek

ji derî dixuye. Ji deriyê mala Memduh Selîm Begê!..
Jinik bang li zarokan dike. Bi tirkî. Keçika biçûk direve
û dere hundir, dikeve mala Memduh Selîm Begê.
Ev çi ye? Rv çi tişt e? Ev kî ne?
Memduh Selîm Beg, bi lez, nêzîkî li derî, li jinikê di-
ke. «Hûn kî ne? Hûn li vê malê rûdinin?..» Pirsine. Bi
tirkî. Bi heyecan. Bi lez.
Belê. Malbateke ermen. Wan nû ji Turkiyê koç ki-
rine. Belê, zarok jî yên malê ne. Mêrê malê mamoste
ye. Ew ne li malê ye. Berî şeş mehan ew hatine vê ma-
lê. Bi alîkariya dostekî wan yê çerkez. Lê ew ji malê
zêde ne razî ne. Mal biçûk e. U tiştekî din; wan tiştên
nebaş di derheqê kiravanê kevn de bihîstine. Dilê wan
pê dişewite.
«Çi... we çi bihîstiye? Hûn wî dinasin?»
165

Rewşeke balkêş. Tiştê ku Memduh Selîm Begê nedi-
pa. Pirs li pey hev tên... Naxêr, ew kiravanê kevn nena-
sin. Ne jinikê û ne jî mêrê wê ew tu carî nedîtine. Wan
bihîstiye ku ew merivekî hêja, dilsoz û pak bûye. Lê
hinekî dînek... Wan li ser evîna wîjîpir tişt bihîstine.
U berî niha bi demeke dirêj, camêr, kiravanê kevn çûye
rehmetê.
«Çawan? Te got, ew çûye rehmetê? Li kû? Kengê?»
Belê, ew çûye rehmetê. Jinik baş pê nizane ka kengê,
çawan û li kû. Lê li gor gotinan, camêr di şerekî de ha-
tiye kuştin.

«Camêr hatiye kuştin...» Ecêb. Ecêba giran. Memduh Selîm Beg li Antaqiyayê, h ber mala xwe dibihîse ku Memduh Selîm Beg hatiye kuştin.

2

Li mala bavê Ferîha'yê. Li mala dostê çerkez. Eynî roj. Evar. Memduh Selîm Beg û dostê wî li odê rûniştine. Bêdeng. Bi qahr û keser. Ji derve dengê baranê tê. Bêdengiya hundir ewçend zîz e ku meriv derzî bavê erdê, dengê derzî dê were bihîstin.

Evareke tahl, kirêt, zîz, ji agirê dûjehê xirabtir. Evareke ewçend dilsoj ku bi peyvan nayê salixdan. Ma Memduh Selîm Beg ji vê êvarê xirabtir êvar jiyaye? Ew niha mirinê dil dike. Di dewsa vê êvarê de mirinê. Xwezî ew, bi rastî, li ser çiyayê Agiriyê bihata kuştin, bombeyeke balafirê, bi rastî, bihata û li ser serê wî biteqiya...

Vê êvarê dinya wî hilweşiya. Miraz û daxwaza wî ya herî mezin, herî xweş, herî muqeddes şikest. Dinê li ber wî reş bû. Mala hevalê çerkez bû cehenem. Dilopên barana derve bûn pêtên êgir û ketin pêsîra wî...

Ew çi bibêje, çi bike? Ji destên wî çi tê?

166

Ferîha tune. Ferîha çûye. Ferîha zewiciye. Belê, rast e, wê mêr kiriye û çûye Urdinê.

Hin demên kin û kurt hene ku dikarin jiyanekê, bi carekê, ser û bin bikin. Hin roj, şev yan jî demên bûyeran hene ku di jiyanekê de şopin kûr, pir kûr dihêlin.

Hin xeber hene ku wekî berikekî, tîrekî dadicike dilê meriv û di dilê meriv de birînên kûr û ebedî vedikin. Ferîha wekî stêrkekê firiyaye û ber bi deverekî nenas çûye, winda bûye. Ken û çirûskên li ser çavên wê hew ronahî direşînin ser malê. Bedena wê ya bedew hew dixuye. Bîhna wê hew malê tijî dike. Dengê kemançê hew tê. Di dewsa wê de, niha, li mala bêdeng pisîngekê heye. Pisîngeke biçûk û belek. Pisîng li quncikeke odê dirêj bûye û bêdeng dibihnije, -wekî ku wê jî hay ji rewşê heye.
Dê, pezkoviya mader, li holê naxuye. Niha, bi zewaca Ferîha'yê, miraza dilê wê bi cîh bû? Qise û gotinên wê xelas bûn? Gelo ew niha çi difikire? Dilê dê! Dilê mal-kambax!
«Tiştê bû, mekeve dû.» Gotina kurdan. Lê niha ev gotin ne rast e. Çawan mekeve dû?.. Tiştê kubûye,ji-yana Memduh Selîm Begê ser û bin dike, di jiyana wî de şopin kûr dihêle. Ew bi vê yekê dizane. Tiştê ku bûye, windabûna evînekê ye. Evîneke paqij, delal, xweş. Qederê! Siûda xirab!.. Sersariya Memduh Selîm Begê. Ne qeder, ne jî siûd. Sersariya, gêjahiya wî bi xwe. Sebeba esasî ev e. Ma evîn bergeheke bêruh e ku her û her di dewsa xwe de bimîne? Ma Memduh Selîm Begê nizanîbû ku evîn jîndar e? Ma meriv lê xwedî der-nekeve, wê neparêze, jê hez neke, ew dikare bijî û geş be? Ma gul bê av, ax û tavê dibe?
Sersariya Memduh Selîm Begê bû sebebê windabûna evîn û evîndara wî. Ev yeka weha ye. Ew divê li xwe

gilî bike, ne li kesekî din. U ew dê her û her bikeve pey tiştê bû. Ew dizane, tiştê bû dê her û her pê re be. Wekî nexweşiyeke bêeman. Wekî kuleke xedar. Wekî siya wî.

Di bêdengiya şeva Antaqiyayê de, Memduh Selîm Beg, li oda tarî, h nik dostê xwe rûniştiye û bi van yekan dihese.

Eger Memduh Selîm Beg hinekî zûtir, berî du-sê mehan bihata, tiştê bû, dê nebûya. Hingê jî wext û keys hebû ku meriv rê li tiştê bû bigirta. Yan jî Memduh Selîm Begê xeberek bigîhanda dostê xwe, bi awakî nîşan bida ku ew dijiya.

Name? Nameyên ku Memduh Selîm Begê şandibûn? Ne name, ne jî xeber. Tu name negîhane destê dostê wî. Tiştê ku wan bihîstine, şehîdbûna Memduh Selîm Begê bûye. Ji her kesî, li her derî. Hevalên Memduh Selîm Begê jî welê bihîstibûn, ew heta niha jî welê dizanin.

Kî dizane ka çi bi serê nameyan hat? Ew li kû man û ketin destê kê? Ma kevir dê bibariya, eger nameyekê bigîha Antaqiyayê!.. Ma riyeke din û çêtir tunebû ku Memduh Selîm Beg xeberek bigîhanda dostê xwe? Ma hevalên wî, Partiyê nikaribû xwe biêşanda û rastiyê hîn bibûya? Ma Ferîha'yê nikaribû hinekî din jîbipa? Ma çima Memduh Selîm Beg hinekî zûtir nehat? Çima dengê mêjî zora dengê dil bir? Çima dil weha qels der-

ket, dengê xwe bilind nekir?.. Ma, çima, eger...
Di êvara tahl, kirêt û zîz de fikir û gumanên têvel.
Hawara bêdeng ya dilê şewitî. Hêstirên hilweşîna mi-
raz û hêviyan.
3
«Lê binihêrin, dê û xwîngên min, lê binihêrin...»
168

«Wî diya min, ma kê dizanibû ku ew dê weha be.»
«Belê, belê... lîstika siûdê. Xwedê dike, diya min,
Xwedê... binihêrin Memduh Selîm Begê keserkûr ça-
wan dimeşe, çawan pê li kevirên kolanê dike.»
«Mirazkoro mêro! Bextreşo mêro!»
«Lê gunehê wî bi xwe bû, diya min. Ma Xwedê jê
girtibû? Ma çavên wî nedidîtin? Ma wî nedidît çawan
Ferîha vedimire, diçelmise?»
«Axir... heyf bû, xwişka min, heyf. Mirazên vî mêrê
hêja qurmiçîn û Ferîha reben jî ket çolan û ket hem-
bêza kalemêrekî qozikxwar.»
«Tifû li te bextê reş...»
«Hûn dibînin Memduh Selîm Beg çawan kal bûye...
Rûyê wî hûr bûye, çavên wî ketine kortê, pişt û stû lê
xwar bûye.»
«Wele diya min, ew dîsan baş li ber xwe dide. Ma kî
bûya, piştî evçend tişt û bûyeran, ew dê bêtarê bêtaran
bihata serî.»
«Dev jê berdin lê, heq û misteheqê wî ye.»
«Wer mebê, diya min, wer mebê. Guneh e. Me, her

kesî bawer dikir ku ew miriye. Lê ew vegeriya û hat. Bi daxwaza zewacê... Ew çi bike! Di qedera wî de weha hatiye nivisîn.»
«Xwedê merivan ji bêtarên giran star bike.»
«Lê halê wî tu ne hal e. Welatê wî çû. Mal çû. Dest-girtî çû. Kar çû. Heval û dost çûn... Ne rehet e, diya min.»
«Xwedê pê re be, Xwedê piştgirtî lê bike.»
«Ew niha çi dike, li kû dimîne?»
«Dibêjin, ew niha li otelekê dimîne, bi şev û roj li wir e. Ew ji otêlê dernakeve. Bi şevan, heta sibê lampa wî vêketiye...»
«Ew niha ber bi kû dere?»
169

«Kî dizane diya min, heye ku ew bi xwe jî pê niza-ne.»
«Ka ew Memduh Begê ku nû hatibû û bi rêçûyina xwe kolan dihejand.»
«Xwedê mezin e, diya min. Rûyê wî jî dê, rojek, bi-kene. Xwedê dê deriyeke xêrê jê re jî veke.»
«Xwezî, diya min, xwezî... tu xirabiya vî camêrî ji kesî re nebûye. Her kes jê hez dike. Ma çirna ev derd û bela tên serê wî?»
«Bav û diya Ferîha'yê jî pir li ber xwe dikevin, pir pê diêşin.»
«Ma kê texmîn dikir, diya min, ku Memduh Beg dê vegeriya!..»

«Eger Ferîha pê bihese ku Memduh Beg dijî, ew dê dîn be.»
«Rebena Ferîha'yê, bextreşê, belengazê...»
«Xwedê sebir û taqet bide wan.»
4
«Monsieur Memduh Selîm, mixabin ji destê min tiş-tekînayê. Biryar ji jor e...»
Li makama Major Collet. Major Collet; kumandarê hêzên eskerî yên fransizan li Antaqiyayê. Serokê heremê. Hukimdarê Iskenderûn û Antaqiyayê. Fransizekî navsal, bejndirêj, pozmezin, porspî û rûtirş.
Darbe h ser darbê tên. Memduh Selîm Beg di bin darban de dihinciqe. Niha jî darbeyeke giran ji fransizan tê; kar ji destê Memduh Selîm Begê tê girtin. U ne bi tenê ev, herweha, ew divê dev ji Antaqiyayê jî berde. Yanê dîsan sirgûnî, penahendegehî. Ber bi Şamê. Di welatê xerîbiyê de jî sirgûnî.
«Monsieur Memduh Selîm, tu diviya bi siyasetê bilî nebûyayî. Di destpêkê de, gava tu hatî Sûriyê, qewlê
170

me, bi te re, welê bû. Lê te ev qewl xist bin lingan. Li gor raporan, tu yek ji serokên organîzasyona siyasî Xoybûnê yî. U bi qasî demeke dirêj, tu li Araratê mayî. Weha nabe, Monsieur, weha nabe...»
Fransa, fransiz, hukimdariya wan ya Lubnan, Sûriye û Antaqiyayê, major Collet û siyaset. Siyaset... Memduh Selîm Beg divê siyaset neke... Memduh Selîm Beg

niha çi bike? Bigirî yan bikene? Ken. Bê guman, ken. Pêşî hêdî hêdî. Wekî ku ew dibişire. Ken li ser rûyê Major Collet jî. Paşê, piştî kena nerm, coşa kenê. Berz. Pir berz... Haaa... haaaa... haaaaa... Bi dirêjahiya deqîqan. Demeke dirêj. Major Collet niha nakene. Ew, bi heyret, li Memduh Selîm Begê dinihêre. Lehiya kenê bi ser Memduh Selîm Begê re hatiye. Ew dikene, dilerize, dest û piyên xwe dihvîne. Kenê kel daye.

Belê, Memduh Selîm Beg divê li ser ken û celebên kenê bixebite û tiştekî dirêj binivîse. Wekî ronakbîrekî kurd. Ew divê trajedî-komediya ku li welatê kurdan berpêş dibe teswîr bike... Ken; babeteke cîddî. Kena kêfê, kena kerbê, kena rik, kena serbestiyê, kena bindestiyê, kena maxrûrî û biserketinê, kena têkçûn û hilweşînê. Kena Major Collet û Memduh Selîm Begê... Memduh Selîm Beg divê li Aristoteles vegere, Molier bixwîne û tarîxa kena rûgeş û kena rûreş derxîne û tarîxa kena rûgeş û kena rûreş ya Kurdistanê li wan zêde bike. Ken. Kena ku ji tirsê pêk tê, ji nezaniyê pêk tê, ji bêçaretî û bêgaviyê pêk tê... Memduh Selîm Beg dikene.

«Monsieur Collet, li min bibuhirin, min nema dikaribû xwe ragirta. Hûn behsa siyasetê dikin. Em li kû, siyaset li kû? Siyaset karê we mezinan e. Em xelkên hûr, reben û nezan ji siyasetê çi fahm dikin? Siyaset di mit-

171

baxa we de bi kel dikeve. Para me jî bîhnkirina wê ye.»

Piştî kena berz û dirêj, li ser siyasetê jî gotareke dirêj. Bi dengekî nerm. Bi edeb û terbiye. Lê her peyvekê ji berikekî xurttir. Di oda fireh û xweşraxistî de, niha kerb, kîn, hêrs û rik dipeyive. Ji tiştê windabûyî pê ve, ma tu tiştên ku Memduh Selîm Beg, êdî, winda bike, mane?..

«Welatê me perçe bûye, her tiştê me hatiye qedexekirin, xelkê me di bin eziyet û zulmeke ecêb mezin de ye... Eger hûn, belê hûn di rewşeke weha de bûna, we dê çi bikira?»

Bêdengî. Li Memduh Selîm Begê nihêrîn. Lê bêden-

«Em jî ew tiştên ku her kes mecbûr dimîne û dike, dikin, monsieur Collet. Ne zêde, ne kêm. Em dixwazin welatê xwe biparêzin. Em siyaset nakin, xwe diparêzin, dixwazin xwe biparêzin. Siyaset ne karê me ye...»

«Ez dizanim, monsieur Selîm, ez dizanim, rewşa we ne baş e.»

Dîsan ken. «Rewşa we ne baş e...» Pêşî hêdî hêdî. Paşê wekî rûbarekê, wekî lehiyekê. «Rewşa we ne baş e...» Peyvên kîbar û nazik. Lê sar. Bê ruh. Ji rastiya germ û dijwar ya kurdan pir bi dûr. Rastî, rastiya kurdan. Rastiya merivê kurd. Rastiya jiyana Memduh Selîm Begê. Jiyaneke tevlihev, têkel, bi lez û bez, bêdaxwaz û miraz, tijî tehlûke, her gav nêzîkî mirin û kuştinê. Wekî gerekê, meşekê di newala mirin û kuştinê de. U peyvên ku doralî li jiyana Memduh Selîm Begê girtine; mirin, kuştin, bidarvebûn, bidarvekirin, zîndan, girtîxane, zor, zordarî, bindestî, sirgûnî, hawar, şer, li-

berxwedan, fedakarî, xebat û h.w.d...
Gava jiyanek bi van peyvan were rapêçandin, hingê çi dibe? Ev sereskerê fransizî ku li hember rûniştiye û fer-
172

manan direşîne, dikare jiyaneke weha fahm bike?
Ken . . . haaa. . .haaaa. . .haaaaaaaaa. . .
Esebiyet.
«Monsieur Collet, ez bi gotinên we bawer im. Bê guman, hûn bi rewşa me dizanin. Lê ez baş ne bawer im ku hûn wê têdigihên. Ma hûn, bi rastî têdigîhên, hûn dikarin têbigihên?.. Hûn jî dizanin, zanîbûn tiştekî ye, têgihîştin jî tiştekî din e. Têgihîştin ji zanibûnê dijwartir e. Pir dijwartir e. U hin tişt jî hene ku meriv divê wan bijî da ku wan têbigihê...»
5
«Berî min wext tunebû, piştî min jî
wext dê nebe
Wext bi min re dest pê dike
U bi min re diqede...»
Çend rêz ku ji rojên Parîsê û xwendinê mane û hê jî di heşê Memduh Selîm Begê de ne. Çend rêz ji Daniel von Czepko, Sexcenta Monodisticha Sapientum, ji sala 1655 an. Ax ew roj! Rojên xwendin, tarîx û felsefê. Rojên şêt yên xortiyê. Rojên hînbûn û haziriyê. Rojên germ, zelal û pak. Ji wan rojan çi man? Çima wextê, wexta malkambax weha kir?
Tola wextê. Belê, gotinek rast û di cîh de. Wext tola

xwe distîne. Wext şopa çewtî û şaşiyan hildide û tê to-
la xwe digire.
Memduh Selîm Beg û wext. Tola wextê û Memduh
Selîm Beg. Xezeba wextê û Memduh Selîm Beg. Li
meyxana ermenan. Di navîna şeva reş de. Li ber xezeb
û tola wextê. Birîndar. Stûxwar. Bîhnteng. Dilşikestî.
Hêvîşikestî. Ferî çavan vemirî. Lê keneke qurmiçî li
ser rû.
Bi serê xwe, tenê. Li ser masê çend texlîd xwarinên
173

ermenî. Dost û yara jibîrkirin û teseliyê; şûşa araqê.
Cacix. Pakêteke cixara Gitane. Li koşa meyxanê, wekî
her carî, bilûrvanê kal. Dengê bilûra wî ya melûl. Çend
kesên din li dora çend maseyan.
U wext... û tola wextê.
Memduh Selîm Beg divê dev ji Antaqiyayê jî berde.
Di nav du heftan de. Ew divê jiyana xwe ya sirgûniyê
hilde pişta xwe û here deverekî din yê sirgûniyê; Şamê.
Merivdewletên fransiz ronakbîr û xebatkarên kurdan ji
ser tixûbên Turkiyê bi dûr dixînin... Piştî evçend tiş-
tên tahl, niha jî, pêşerojeke nexuya.
Wext niha li dijî Memduh Selîm Begê diherike, dilê
wî digivişîne, mêjiyê wî dike warê şerên dijwar. Wexta
malkambax niha her tişt guhertiye; reng bi tenê bûne
rengên bed û mirdar, bîhn bi tenê bûne bîhnên genî,
tahm bi tenê bûne tahmên tahl, tûj û tirş, deng bi tenê
bûne dengên nexweş û hîs bi tenê bûne hîsên mirî...

Memduh Selîm Beg çi divê? Ev divê çawan xwe li hember êrîşên wextê rabigire?.. Wext divê neherike. Wext divê bi wî dest pê bike û bi wî biqede, -wekî ku di ew rêzên rojên Parîsê de hatibû nivisîn. Lê çawan? Meriv çawan dikare zora wextê bibe?.. Wî di destpêka 1900 an de kitêbeke H.A.Giles xwendibû; ChuangTzu. Di kitêbê de, berî 2500 salan Chuang Tzu xewnek dibîne. Di xewnê de ew pepûlekeke biçûk e û difire. Gava ew ji xew hişyar dibe, ew nizane ka ew pepûlek e ku di xewna xwe de merivekî dîtibû yan jî, ji bervajiyê, ew merivekî bû ku di xewna xwe de pepûlekek dîtibû. Chuang Tzu weha digot;
«Min di xewna xwe de didît ku ez pepûleyek bûm ku li asmanan difiriyam û min tu tişt di derheqê Chuang Tzu de nizanîbû.»
Chuang Tzu hosteyê xewnan bû. Bê guman. Wî wext
174

h gor xwe eyar dikir. Ew serdestê wextê bû. Reng, bîhn, tahm, deng û hîs li gor daxwaza wî şekil digirtin. Ew hosteyê peyv, gotin, qise û terman bû jî. Wî bi xwe naverokek dida wan. Gava wî dixwest, ew dibû pepûle û gava dixwest jî, ew dibû meriv.
Memduh Selîm Beg jî divê bibe serdestê wextê. Wext divê li gor daxwaza wî şekil bigire, ne ku ew. Gava bîhn lê teng dibe, nefes lê diçike, ew divê bibe pepûleyek û bi firê bikeve. Do, îro û sibe divê bikevin nav hev û ew di nav wan de, li gor daxwaza dilê xwe, here û

were. Ew çar deng, ew çar dengên pir hêja divê winda nebin. Ew divê xwe ji xezeba wextê bide alî û li hember lîstikên qederê xwe rabigire û bikene. Yan na, yan na...
Hingê Memduh Selfm Beg nabe Memduh Selîm Beg. Hingê ew têk dere û hew ji navîna şeva reş derdikeve. Meriv di nav wextê de dijî, di rûbara wextê de diherike. Lê Memduh Selîm Beg divê, bi xwe, bibe rûbar. Wext agir e ku dişewitîne. Lê Memduh Selîm Beg divê, bi xwe, bibe agir. Dinya heye. Wext heye. Lê Memduh Selîm Beg jî heye.
Yan na... Yan na...
Lê çawan?
6
«Ferîha'yê, Xezalê,
Li te difikirim,
Li evînê, evîna me difikirim.
Li rastiya can, dil û ruh difikirim,
Li tesîrên wan, li ew demên me yên kurt, lê xweş û hêja difikirim.
Ez, hevalê te, evîndarê te yê bêheş di nav valahî û bêdengiyeke boş de rûniştime û difikirim,
175

Li wext û xezeba wextê difikirim, li wexta bihurî.
Ew demên xweş bihurîn, ew çûn, êdî ew bi şûn de venagerin,

Edîderenge,pirdereng...
Lê ez heme, ez dijîm, mixabin, ez heme, ez dijîm.
Li Şamê, di nav dilkeseriyeke malkambax de.
Ez li te difikirim,
U difikirim ku ez dê, tim û tim, li te bifikirim...»
Memduh Selîm Beg ne şafr e. Ew bi tenê evîndarê şi-
îran e. Ev cara yekemîn e ku Mernduh Selîm Beg rahiş-
tiye penûsê û bi awakî şiîrî kerb û keserên xwe tîne
zimên. Bi tirkî. Ne ji bo kesekî din. Ji bo xwe. Ew di-
zane; nivîsîn jî derman e. Dermana dilên bi birîn.
Dermana li dijî xezeba wextê.
Wekî pir tiştên din, niha Antaqiye û jiyana Antaqi-
yeyê jî li pey wî man. Niha Şam heye. Şama şerîf. Ba-
jarê kevn. Yek ji navendên kultura îslamê. U li Şamê jî
taxa kurdan. Belê, taxa kurdan. Warê kurdên Şamê.
Taxeke peregende, neçar, belengaz. Di quntara çiyan
de. Xanî li ser hevûdu. Kolan û kuçên biçûk û tevlihev.
Taxek ku ji jiyana bajêr bi dûr e. Warê kurdan; warê
kesên bêwelat, warê kesên ji welatê xwe reviyayî, warê
kesên ku nikarin li tu deveran bi cîh bin û rehên xwe
biçînin erdê.
Memduh Selîm Beg li mala dostekî xwe dimîne. Bê
guman di taxa kurdan de. Ji Memduh Selîm Begê pê
ve, gelek kesên din jî sirgûnê Şamê bûne. Piraniya wan
jî hevalên Memduh Selîm Begê ne; Celadet Bedirxan,
Qedrî, Ekrem û Mihemed Cemîlpaşa, Hemzeyê Miksî,
Dr. Nafîz û birayê wî Nureddîn Usif. Ew jî li taxa kur-
dan, li mala Elî Axayê Zilfo dimînin. Herweha Haco

Axa û zarokên wî jî.
Hevalên wî, niha, dizanin ku Memduh Selîm Beg nemiriye û dijî. Niha Memduh Selîm Beg jî dizane ku hevalên wî pir xwestine ku alîkarî li Agiriyê bikin û xwe bigihînin şoreşê. Lê ji ber sebebên dûr û dirêj tu tişt bi dest neketiye. Niha ew dizane ku hevalên wî, serokatiya Xoybûnê hewl daye ku ji ser tixûbên Sûriyê jî serîhildanek pêk bînin û êrfş bibin ser Turkiyê. Wan xwestiye bi vî awayî jî alîkarî li şoreşa Agiriyê bikin.
Lê mixabin, ev jî bi ser neketiye. U ji ber vê yekê ye ku fransizan kurd ji tixûbê bi dûr xistine û ew anîne Şamê. Niha ew dizane ku navbera Turkiye û Firansê ji her carî çêtir e.
U Memduh Selîm Beg niha bi tiştekî din jî dizane; şoreşa Agiriyê bi temamî têk çûye, Ihsan Nûrî Paşa û hevalên wî xwe spartine Iranê, ji şervanan gelek li der û dorên Agiriyê mane û hinan jî xwe gîhandine Sûriyê û ordiya tirk her der vegirtiye û gundên doraliya Agiriyê kavil dikin... U dinya jî, bêdeng, li vê bûyerê temaşe dike.
Bûyerên nexweş û tahl yek h pey yekî tên. Her der tarî ye. çilka hêviyê li tu derî naxuye.
Memduh Selîm Beg jî li mala dostê xwe rûniştiye û li xwe, li siûda xwe, li Ferîha'yê, li şoreşa Agiriyê, li Ihsan Nûrî Paşa û Yaşar Xanimê, li Xoybûnê, li hevalên xwe yên din, li wextê û li pêşeroja xwe difikire...

7
Memduh Selîm Beg, Celadet Bedirxan Beg, Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa Began. Bi hev re. Hevalên Memduh Selîm Begê hem kêfxweş in, hem jî xemgir in. Ew kêf-xweş in, ji ber ku Memduh Selîm Beg nemiriye û dijî. Ew xemgir in, ji ber ku Memduh Selîm Beg negîha mi-
177

rada xwe. Ew Memduh Selîm Begê bi tenê nahêlin û her pê re ne, pê re dipeyivin.
Lê belê, tiştekî heye ku ne Memduh Selîm Beg têdi-gihê û ne jî hevalên wî; çima Ferîha'yê zewaceke weha dil kir? Çima wê weha xwe feda kir? Ew bi çerkezekî Urdinî re zewicî ye. Bi çerkezê dewlemend Edîb Aswar re. Lê belê, çi zewac! Edîb Aswar li ser 50 salî ye. Edîb Aswar berê jî zewiciye û xwediyê du jinan e. Edîb As-war qozikxwarekî û rûtirşekî ye. Edîb Aswar nexwen-da ye. Edîb Aswar jiyaneke bedewî dijî... U Ferîha di nav evçend mêran de Edîb Aswar hildibijêre! Çima? Ça-
wan keçeke welê delal, xwedî zewk û tahm, xweşper-werdebûyî, musîkşînas, xwedî hîsên zirav bi merivekî wekî Edîb Aswar re dizewice? Çawan ew dikare xwe weha qetl bike û êşeke xedar têxe dilê Memduh Selîm Begê, nas û dostên xwe?
«Mîrên min, ez jî fahm nakim. Ev celebeke qetl e, xwekuştin e. Bi vî awayî, wê xwe jî kuşt, ez jî kuştim. Ez dizanim, evîna me li ber dilê wê pir bi qedr û qîmet

bû. Ez dizanim, wê ji min pir hez dikir. Lê ma wê tu ferq di navbera min û Edîb Aswar de nedîtin? Çima wê weha kir?..»

8

Destpêka 1933 an. Hê jî li Şamê. 1923 û 1933. Deh sal. Di welatê xerîbiyê de deh salên xerîb û ecêb. Gava Memduh Selîm Beg ji Turkiyê derket, ew bi niyeta salek-du salan derket. Salek- du sal bûn deh sal. Hê çend salên din divên? Ma ew dê rojekê venegere welatê xwe? Reng e ku ew vegere. Niha îmkanek derketiye ser riya wî. Keysekê lê dixuye. Lê ew nikare biryar bide. Ew vegere yan bimîne? Dudilîtî. Fikir û gumanên nezaniyê. Ew hem dixwaze vegere û hem jî naxwaze.

178

1933 di eynî wext de dehsaliya damezrandina Komara Turkiyê ye. Gava Komara Turkiyê hat damezrandin, Memduh Selîm Begê jî dev ji Turkiyê berda... Niha, piştî deh salan, Turkiye e'fuyeke giştî derdixe. Ji bo kesên ku ji Turkiyê hatibûn derkirin. Ji bo kesên ku li derveyî welêt, li dijî Turkiyê xebitîne. Bê guman Memduh Selîm Begjî yek ji wan e.

Berî niha bi sê heftan, yanê roja 21'ê meha 12 an ya 1932 an, sefîrê Turkiyê Memduh Selîm Beg dît. Sefîr xwestibû wî bibîne. Sebebê hevûdudîtinê ev bû; eger Memduh Selîm Beg vegere Turkiyê, ew dê efû bibe û bikaribe wekî hemwelatiyekî Turkiyê, bi awakî serbest bijî. Ev danezan, herwekî Memduh Selîm Begê, gihîş-

tiye kurdên din jî.
Niha çi divê? Ef derdikeve. Imkana vegera welêt tê pê. Hesret û derd û kulên xerîbiyê dikarin li pey bimînin. Ew dikare, ji nû ve, piştî deh salan, bav û xwişka xwe bibîne, eger bixwaze li Stembolê yan jî li Wanê bi cîh be. Ew dikare here û di nav gelê xwe de, bi însanên xwe re bijî.
Lê li milê din jî hin rastî hene; di biryara e'fûyê de ji bo kurdan, h ser kurdan tu tişt nayên gotin. Rejîma nû, niha, tewr hebûna kurdan jî nenase. Zor û zulim li welêt her berdewam e. Ma evçend xebat, evçend zehmetîkêşan, derd û keder ne ji bo azadî û serbestiya kurdan bû? Gelo ew niha vegere, ew dê li xwe mikur neyê? Ew dê îxanet li xwe, li jiyana xwe, h doza xwe û li gelê xwe neke? Ew dê, bi vî awayî, siyaseta rejîma nû ya Turkiyê nepejirîne? U digel van yekan; ma kî garantî dike û garantî dide ku ew dê h Turkiyê neyê kuştin? Ma wî hindik bêbextiya rejîma nû dîtiye? Paşê, ji bav û xwişka wî pê ve, tu heval û dostên wî li Turkiyê neman. Piraniya wan hatin kuştin, yên mane jî li der-
179

veyî welêt, pardarê siûda Memduh Selîm Begê ne. Di nav van deh salan de pir tişt guherîn. Ew jî, hinekî, hînî jiyana nû bû. Li Sûriyê heval û dostên ku ew bikaribe pê re be, hene.
U tiştê herî girîng; Ferîha. Ew dê çawan Ferîha'yê, evîna xwe ya abadîn h van çolan berde û rûyê xwe jê

bade? Bila Ferîha zewicî be, bila Ferîha'yê kuleke bê-
derman xistibe dilê wî. Lê Ferîha evîna wî ye. Her û
her. Heta mirinê. Ew dev jê bernade...
Çi divê? Çûyin yan mayin? Di nav zîncîra pirsan de
helqa esasî. Heyameke nû, gaveke nû di jiyana Mem-
duh Selîm Begê de. Biryar divê li gor vê yekê were gir-
tin.
9
21. Nîsan, 1934. Antaqiye.
«Miri aziz ve muhteremim Efendim,
Şûkrû Mehmet'in son mektubunu zati alinize gön-
...
derecektim, fakat kalinca bir mazruf teşkil edecegi için
kitabina ve bana ait kismim aynen istinsah ediyorum.»
Name. Nameyeke dirêj. Ji Celadet Bedirxan Begê re.
Bi tirkî. Kesê ku namê dinivîse; bê guman Memduh Se-
lîm Beg. Peyvên wî. Qiseyên wî. Bi kurdî weha:
«Mîrê ezîz û efendiyê min'ê muhterem,
... Min dê nameya dawîn ya Şukrî Mihemed ji we re
bişanda, lê ji ber ku ew dê bibûya zerfeke mezin, ez
beşê ku h ser min û kitêba wî hatiye nivisîn, ji we re
dinivîsim û dişînim...»
Belê, Memduh Selîm Beg li Antaqiyayê ye. Ji nû ve.
Ew venegeriya Turkiyê. Herwekî hevalên wî yên din,
wî li xwe dananî vegere. «Mîrên min, veger jî divê li
gor hin qayidan be. Gava me her celeb qayide û bawerî
dan bin lingên xwe, hingê mana jînê çi ye?..» Qiseyên
180

wî. Baweriya wî. Awayê fikirîn û jiyîna wî. Xwediyê qayide û prensîban. Yek ji wan; her celeb bûyer, mezin yan biçûk, girîng yan negirîng, divê bibin helqeyên zîncîra jiyanê. Rojên kin û kurt divê bibin helqeyên zîncîra jiyanê. Wext, tevî her celeb encamên xwe, divê rê li zîncîra jiyanê negire. Eger meriv nikaribe vê yekê bike, hingê bûyer, roj, wext mana xwe winda dikin. Yanê jiyan mana xwe winda dike.

U tiştên din ku di vê navberê de bûn helqeyên jiyana Memduh Selîm Begê; daxwaza wî ya vegera Antaqiyayê qebûl bû, - ji ber sebebên tenduristiyê. Wî dest bi karekî nû kir, mamostetî. Wî ji xwe re maleke hûr, du ode, peyda kir û ew niha tê de rûdine. Wî ji nû ve peywendî bi heval û dostên xwe re danî. Herweha bi bav û xwişka xwe re jî. U tiştê herî girîng; wî bi alîkariya dotmama Celadet Bedirxan Begê, Rûşen Xanimê xeberek ji Ferîha'yê re şand da ku ew ji mêrê xwe veqete, dev ji Urdinê berde û vegere, were bi Memduh Selîm Begê re bizewice. Wî ev yek ji bavê Ferîha'yê re jî got. Ew niha li benda bersîva Ferîha'yê ye.

Niha, îroj roja naman e. Ew rûniştiye û name dinivîse. Dora nama Celadet Bedirxan Begê ye. Li ser dostekî wan yê kevn; Mihemed Şukrî Segban. Bijîşk û welatperwerekî kevn. Endamê Xoybûnê. Niha h Fransê. Wî kitêbokek li ser kurdan û doza kurdan nivisiye. Kitêbeke çewt û şaş. Kitêbeke ku li gor daxwaza dijmin hatiye nivîsîn. Jê re bersîv divê. Bersfveke bi rêk û pêk.

Bersîveke li ser rastî û belgeyan avabûyî. Bi zimanekî xweş û cîddî.
Niha, ew rûniştiye û van tiştan ji dostê xwe yê kevn Celadet Bedirxan Begê re dinivîse.
Memduh Selîm Begê reben! Li milekî ew name dinivîse, li milekî jî ew li bûyer, wext û siûdê difikire...Ew
181

dê hê çi bibîne! Çavên wî yên bi ken dê hê şahîdên çi bibin, çi nebin! Her weha ye; di rojên teng, tarî, dijwar û malkambax de heval, dost û hogir kêm dibin. Her weha ye; şikestin, biserneketin bi xwe re qurbanên xwe û şikestinên nû tînin. Her weha ye; di rojên dijwar û şikestxwarinê de, ji kêfa îxanet, durîtî, fetbazî, berberî, sextekarî û hesûdiyê re payan tune. Gur ji mij û dûmanê, îxanet û durûtî jî ji rojên teng û dijwar hez dikin. Kurd rojên weha dijîn. Hêvî têk çûn. Miraz qurmiçîn. Siûda xirab neguherf. Serîhildana Agiriyê şikiya. Bi dû şikesta Agiriyê re, partiya Xoybûnê jî şikest xwar. Berberî, dijîtî û dijminahiyên stûr hatin pê. Gelek kes çûn û teslîmî Turkiyê bûn. Gelek kesîrû ji heval û dostên xwe yên kevn, ji doza xwe bada. Niha jî hevalekî wî yê kevn kitêbokek h dijî wan û doza wan nivisiye. Niha dostiyeke din ya kevn jî şikest xwar...
«Malmîrato!.. Ma ev bêbextî bi te diket? Ma qet qedr û qîmeta rojên me yên Stembolê jî li nik te tunebû? Ma merivekî zana û têgihîştî evçend xwe biçûk dike?.. Heyf.»

10
Ferîha. Xezalê. Zimanşêrîna ber dilê Memduh Selîm Begê. Stûxwarê. Siûdreşê. Memduh Selîm Beg li dijî wextê şer dike, ew dixwaze bibe serdestê wextê. Ew dixwaze bijî, bi her awayî bijî. Ew naxwaze xwe û mesûhyetên xwe ji bîr bike. Lê birîna ser dilê wî naceribe. Ew her teze ye. Ew bi êş û jana birîna evînê dikeve xew û bi wan hişyar dibe. Ferîha bûye agir û ketiye pêsîra wî. Ferîha her pê re ye. Li her derî. Her saniye û deqîqe. Ew çawan dikaribû weha kor û kerr bûya! Wî çawan dikaribû evîneke weha paqij û zelal, keçikeke weha delal û narîn ji destê xwe birevanda!..
182

Evîn yekta ye. Evîn her roj nayê ber deriyê merivan. «Ew bi sîparişê jî nayê dîtin.» Di hemû jiyana xwe de meriv carek-du caran bi taya evînê dikeve. Ne zêde. Hingê?..
Hingê çima Memduh Selîm Beg li evîna xwe xwedî derneket, bi her tiştê xwe, bi her awayî lê xwedî nebû? Çima?
Lê Memduh Selîm Beg hêvî heye. Ew hêvî dike ku pêlên kêfxweşî û serfirazî yên siûdê dê rojekê lê vegerin. Evîna wî dê lê vegere. U ew dê, dîsan, xwe bidin ber beroşka evînê. Yan na, ev birîna xedar dê wî biku-
Ew li hêviya xeberên pîroz e.
11
1935, rojeke germ ya biharê. Şam. Li taxa Muhaci-

rîn. Li mala Celadet û Rûşen Bedirxanê. Her du bi hev re ne. Wan jiyana xwe yek kirine. Celadet Bedirxan bi dotmama xwe re zewiciye. Jiyaneke mesûd û xweş hatiye pê. Li welatê xerîbiyê.
Her kes dizewice, dibe xwedî mal, dezgeh, zarok û jiyaneke netenê. Lê ji Memduh Selîm Begê pê ve, Herwekî ku tê gotin; kevirên Xwedê li serê wî barîne. Pêlên kêfxweşî û serfirazî yên siûdê lê venagerin. Ji bervajiyê, her ku dere ew jê bi dûr dikevin.
Nebû. Xeberên pîroz nehatin. Evîna wî lê venegeriya. Ferîha nehat. Ferîha dê neyê. Edet û tore rê lê digirin. Edet û toreyên kevnare; belayên serê wî. Dijminên eşq, evîn û hîsên xweş.
«Ma ez naxwazim?.. Ev zewac kozeke agir e û ketiye dilê min. Jîn ji min re bûye heram. Ez her li kek Memduh difikirim... Lê mixabin, ez nikarim dev ji van deran berdim. Ji dilê min nayê. Ez nikarim. Ma xelk dê çi
183

bibêje? Ez bi vî halê xwe çawan vegerim nik bav û diya xwe?.. Nabe... Min xwe kuşt, xwîngê, min xwe kuşt.
Ez êdî nikarim ji kek Memduh re jî bibim yar. Lê ez ji kekê Memduh re nebûm yar, herweha ji kesekî din re jî nebûm...»
Gotinên Ferîha'yê. Ji devê Rûşen Xanimê.
Rûşen Xanim; jineke zane, ronakbîr û dilsoz. Dilê wê bi Memduh Selîm Begê dişewite. Ew dixwaze alîkariyê bike. Lê çawan? Wê çû û Ferîha dît, pê re peyivî, pir

dil kir û xwest dilê wê bigire, wê razî bike. Lê nebû.
«Mallesef, Ferîha pir li dûr e. Eger ew nêzîkî me bû-
ya, me dê, hêdî hêdî, ew razî bikira... Tevî vê yekê,
meriv divê teseliya xwe nexîne. Heye ku ew di rojên
pêş de xwe biguherîne.»
Gotinên Rûşen Xanimê. Jê re. Memduh Selîm Beg li
mala wan e. Bi mêvanî. Ew ji bo serîdanê hatiye. Her-
wekî piraniya caran, mesele dîsan evîna Memduh Se-
lîm Beg û Ferîha'yê ye. Sal dibuhurin, lê mesele, pirs û
birîn her wekî xwe dimînin. Çima? Çima weha bû?
Rûşen Xanim tiştekî ku her kes lê difikire, ji Ferî-
ha'yê pirsiye: çima ew bi kalemêrekî xwediyê du jinan
re zewicî? Bersîva wê di gotinên wê de ye. «Ez ji kekê
Memduh re nebûm yar, lê ez ji kesekî din re jî ne-
bûm...»
«Ax Memduh Beg, ne tu û ne jî mêrên kurd, hûn kes
ji halê jinan fahm nakin. Qet hûn nizanin, tênagihên ew
çi difikirin, çi hîs dikin... Icar tu dizanî, Memduh Beg,
ev fikir ji kû ketiye serê Ferîha'yê?»
«Naxêr, ez pê nizanim...»
«Binevşa Narîn, Memduh Beg, Binevşa Narîn... Te
dastana Binevşa Narînê hînî Ferîha'yê kiriye. Ew ji Bi-
nevşa Narînê hîn bûye ku xwe bi saxî biçîne axa reş.»
Binevşa Narîn... Binevşa Narîn û Cebeliyê Hekkarê.
184

Dastana kevn, dastana evînê. Belê, di wan rojên xweş
de, gava Memduh Selîm Begê di bin siya evînê de be-

dena Xezala xwe dinasî, wî jê re behsa Binevşa Narî-
nê jî kiribû. Wî xwestibû ku Ferîha wê dastanê hîn bi-
be. Evîna Binevşa Narînê, evîna keça koçeran. Evîna
serokeşîrê çiyayên Hekkarê. Evîneke xweş, bi kul û bi-
rîn, kevnare. «Delorî Cembeliyê min delorî, emrê min
bi heyran, serê min bi gorî!..»
Lê kê dizanîbû ku jiyana Ferîha'yê dê bibe jiyana
Binevşa Narînê? Kê dizanîbû ev gotinên hanê yên Bi-
nevşê dê bibin hedîs û bikevin devê Ferîha'yê.
«Bila mêrê meriya bi dilê meriya bî, bila nan hebîû
dew tune bî, bila xwarina meriya garisê bi gilgil bî; bila
lehêfa meriya ezmanê bilind bî; bila doşega meriya ji
erdê şil bî; bila belîfa meriya ji kevir bî; bila tûrê parsê
tim li mil bî; bila binê tûrê meriya bi qul bî; bila cîhê
meriya ne li vir bî, h sînorê Ecem û gêwir bî; bila mêrê
meriya ne bi dilê meriya bî, bila sibê heya êvarê ne kar
bî, ne şixul bî, xwarin û libas pir bî; dilê meriya tim bi
kul bî...»
Jiyan dubare dibe. Derd û keserên dastanan îroj jîbi
car dibin. Peyvên Binevşa Narînê, ji nû ve, ji devê Ferî-
ha'yê derdikevin...Jiyan! Jiyana nenas, jiyana piralî!..
12
Berbanga Antaqiyayê. Li aliyê Rojhelat, di nav çiya-
yên hêşîn û berz de tav hiltê. Giran, giran. Li aliyê
rojava, tîrêjên jar yên tavê pêlên deryayê hembêz dikin
û li ser diçirûsin. Tariya şevê winda dibe. Yek-du
stêrkên mayî jî koç dikin û derin. Wext reng diguherî-
ne. Rengeke ronî, hêdî hêdî, hawirdor vedigire. Di nav

bêdengiyeke zîz de.
Ji dengê pêlên avê pê ve, tu deng tune. Pêl jî, hêdî
185

hêdî, xwe radigihînin qeraxê. Pêl di nav lîstikeke şêrîn de ne; dinya hişyar dibe û ew dikenin, distrên. Bi awayê xwe, bi zimanê xwe.
Li qeraxa avê jî Memduh Selîm Beg. Ew ji rengguherîna tebîyatê hez dike. Di demên weha xweş, bêdeng û balkêş de ew xwe zînde û jiyayî hîs dike. Gava rengên ronî hawirdor vedigirin, ronahiyekê di nava wî de jî hiltê. Hingê bedena wî germ dibe û dilê wî bi germiyeke taybetî hildavê. Digel her celeb derd, kul û keserî...
Niha, ew, dîsan, li ser riya biryarên girîng e. Niha, wî, dîsan, koçeke nû divê. Mixabin. Dinya ber bi rojên germ dilezîne. Antaqiya jî ber bi rojên biryarên girîng dilezîne. Isal, yanê 1937, qedera Antaqiyayê diyar dike. Turkiye doza Antaqiya, Iskenderûn û Kirikxanê dike. Piştî têkçûna dewleta Osmanî, ev dever, herwekî Lubnan û Sûriyê, ji aliyê Franseyê dihat îdare kirin. Niha, 17 sal bi dû peymana Lozanê re, Turkiye ji Fransê daxwaz dike ku ev dever bibin deverên Turkiyê. Par Fransê azadiya Sûriyê qebûl kir. U serokatiya nû ya Sûriyê jî dixwaze ev dever di nav tixûbên Sûriyê de bimînin û dawe dike ku ev dever ereb in.
Franse? Franse jî, wekî her carî, carina li ba tirkan, carina jî li ba ereban e. Ew carina dixwaze ev dever xweser bin, carina bibin tirk û carina jî bibin ereb. Lê

serokamîrê van deveran General CoUet(belê, ew bûye general) bi ser tirkan e. Ew wekî tirkekî dixebite da ku ev dever tevî tixûbên Tirkiyê bin.
Yanê bi gotineke din, rewş baş naxuyê. Memduh Selîm Beg ji tecrubên xwe, ji tecrubên tarîxa gelê xwe dizane; welatên bêkes, bêpişt, bêhêz nikarin xwe li hember hêz û welatên stûrtir ragirin. Ew dibin para şûrê Ruhistîn. Ew masiyên biçûk in û di şerê masiyan de ew dibin para masiyên mezin... Tu pêşeroj ji van deveran
186

re tune. Ew dê yan tevî Turkiyê yan jî tevî Sûriyê bibin. U eger fransiz, bi her awayî, xwe bidin ahyê tirkan, hingê qedera Antaqiya, Iskenderûn û Kirikxanê jî belî dibe. U hingê gaveke nû ya qedera Memduh Selîm Begê jî diyar dibe. Hingê ew divê, dîsan, koç bike û ji xwe re warekî nû bibîne.
Di berbanga ronî ya Antaqiyayê de, li ber qeraxa deryayê, Memduh Selîm Beg hêdî hêdî dimeşe û careke din h siûda xwe, li pêşerojê difikire. Bi dilekî germ û zîz.
13
Rojên reş. Di nav rojên reş de roja reş. Roja şînê. 1939, rojeke ji rojên gulanê. Tarîx û siûdê, bi hev re, biryara xwe dane; rûyê Memduh Selîm Begê dê nekene.
Antaqiya, Iskenderûn û Kirikxan tevî Turkiyê dibin. Qedera wan diyar bû. Di bin çavnêriya heyeteke Koma

Netewan de hilbijartin çêbûn. Meclîseke nû hat pê. Ji 40 endamên meclîsê 22 tirk, 9 erebên elewî, 5 ermen, 2 ereb û 1 yewnan. Ev meclîs û pêkhatina wê qedera Antaqiyayê nîşan dide. Antaqiya hê jî xweser e. Lê di bin wesayeta Turkiyê de. Turkiye li fersendê digere ku Antaqiyê bi temamî vegire. Hêzên çekdar û eskerên tirk ketine bajar û gundan. Ew hêdî hêdî îdarê dixin destê xwe.
U Memduh Selîm Beg. Dîsan li ser riya koçeke nû. Ji welatê xerîbiyê ber bi welatekî din yê xerîb.
Lê îroj!..
Roja şînê. Roja ji du dostên kevn xatirxwestin. Ji bav û diya Ferîha'yê xatirxwestin. Belê, ew jî çûn. Wan xatireyên xwe li pey xwe hîştin û ew çûn. Ji nişkekê ve. Bê xeber, bê gotin, bê gilî û bê gazin. Bi hev re.
187

Ew şewitîn. Nîvê şevê agir bi mala wan dikeve. Kes nizane çawan. Lê ew pir dereng bi xwe dihesin...
Hê berî çend rojan Memduh Selîm Beg û bavê Ferîha'yê bi hev re bûn. Ew li ser bûyerên dawîn yên Antaqiyayê û halê Ferîha'yê peyivîbûn. Ew careke din li ber xwe ketibû ku Memduh Selîm Beg û Ferîha negihîştibûn miraza xwe. Wan jî hazirî dikirin ku dev ji Antaqiyayê berdin û herin Urdinê, nik keça xwe...
Heyhat. Niha, tevî gelek kesên din, li hewşeke fireh ya maleke çerkez, ew h şîna wan rûniştiye. Memduh Selîm Beg du nasên xwe yên nêzîk winda dike. U ji

dara evîna wî ku ber bi hişkbûnê dere, du pelên gewher û jîndar diweşin. Mixabin, dar rût dibe.
U ew... kesa ku av dida darê. Kesa ku dar hişîn kir, dar mezin kir... Ferîha. Xezalê. Li koşeyeke hewşê. Ew tevî çend jin û mêran rûniştiye. Serîgirtî. Di nav kincên reş yên şînê de. Çavên wê yên xweşik ji girînê werimîne. Qermîçek li ser enî û rû zêde, pir zêde bûne. Stû xwar bûye. Ferê çavan winda bûye. Derd, keder û keseran ew pîr kiriye. Ew, bêhereket, bêruh, li ber xwe dinihêre.
Ax wext! Wexta xopan, wexta dîn. Agirê xezebê, berfendeyê derd, kul û xeman.
Ew ji bo şîna bav û diya xwe hatiye. Ew, niha, sêwî û bêkes ma. Gelo haya wî heye ku Memduh Selîm Beg jî di tahziyê de rûniştiye?.. Piştî evçend sal, ev cara yekemîn e ku Memduh Selîm Beg wê dibfne. Cara yekemîn. Memduh Selîm Beg divê pê re bipeyive, xwe bigihîne wê. Lê çawan? Di nav vê şêniyê de nabe. Ew nikare, niha, here ba wê jî. Eger ew here ba wê jî, ew nikarin bi hev re bipeyivin. Di nav vê şêniyê de, di vê roja reş de, ew dê ji hev re çi bibêjin?..
«Siûdê, bela sere mine... tu dîsan li min hatî xezebe.
188

Piştî van salên reş, te ez û ew di rojeke weha reş de anî rûyê hev.»
14
«Bigirî, bi têra xwe bigirî. Kî dibêje tu dê negirî? Kî

dibêje girî şerm e? Bigirî, hinekî din bigirî. Bigirî ku tu hinekî rehet bikî...»
Lê belê, ew bi xwe jî digirî. Hêrs ji çavên Memduh Selîm Begê jî gêr dibin. Ewjî, Ferîhajîxwe ranagirin. Kela giriyê bi ser wan re tê.
Memduh Selîm Beg fersend dît ku bi Ferîha'yê re bipeyive. Ew niha h mala dostekî wî ne. Li odeyeke biçûk û xweşraxistî. Her du bi serê xwe. Bi tenê. Li hember hevûdu. Gava ew hevûdu dibînin, ew nizanin çi bikin, çawan hereket bikin. Ew bêdeng li hember hevûdu rûdinin û li hevûdu dinihêrin. U girî. Pêşî girî. Pêşî bi çend hêstirên zelal derd û kulên roj, meh û salên bêhejmar îfadekirin. Pêşf bi çavên şil hesreta abadîn salixdan. Paşê jî bi dengekî nizm û zîz, bi awakî xemgîn çend peyv.
«Ferîha... hevala ezîz,.. siûda xirab dev ji me bernade. Çima me dê di rojeke weha de hevûdu bidîta?.. U çima te weha li me kir? Min xeber jî şandibû...»
«Memduh abi... ez çi bibêjim? Ma kê dixwest bila weha be? Ez gazinî li kesf nakim, li te jî nakim. Lê, te ez sê car kuştim... Cara pêşîn, gava min bihîst ku tu şehîd ketiye, ez mirim. Cara duwemîn, gava ez zewicîm, ez mirim. Cara siyemîn, gava min bihîst ku tu sax î û vegeriyayî Antaqiyayê, ez careke din mirim... Ez mirî me, Memduh abi, mirî...»
«Na Ferîha, tu divê weha nebêjî, li xwe neheqî nekî. Tu dijî, tu dê bijî... Ez, şev û roj, li te difikirim. Min dînîtiyeke mezin kir, na ne dînîtî, kerîtiyeke mezin.

189

Ez dê rojeke zûtir bi te re bizewiciyama. Min dê nehîş-
ta tu ji hinên din re bibûya yar.»
«Memduh abi, ez ji kesî re nebûm yar. Eger min qu-
wet û hêz hebûya, min dê xwe bikuşta. Lê ez tirsok
derketim û min xwe bi awayekî din kuşt. U niha, piştî
mirina dê û bavê min, ez hinekî din jî mirim.»
«Na, Ferîha, tu dê nemirî... were, dev ji wê jînê, ji
wan deran berde û were. Tu roniya çavê min î, li ser se-
rê min cîhê te heye. Were...»
«Nabe, Memduh abi, nabe. Ez mirirn. Bedena min
çelmisî, dilê min kizirî, mêjiyê min perçe bû. Ez hew
dikarim ji te re bibim yar...»
«Weha mebêje, ez heyran. Were, em bi hevre derd û
kulên xwe rapêçin, em serî bidin serê hev, bi hev re jî-
neke basîd, le bextiyar bijîn. Were Ferîha... ez li heviya
te me. Ez dê heta mirinê h hêviya te bim.»
Dîsan girî. Lehiyek ji hêstiran. Her du bi hev re.
190

PAYIZA UMIR

1
Kî?..
Rûyekî hûr, jar û zerbûyî. Li eniyê qermîçekên sa-
lan, qermîçekên umirekî têkel û rengîn. Porê spî û şeh-

kirî. Çavên reş û li ser çavan du helqeyên gulover û he-
sinîn; berçavik. Li ser lêvan simbêl. Livîna lêvan, bi a-
wakî esebî. Li ser lêvan ken. Keneke paqij, keneke e-
bedî.
Belê, ew; Memduh Selîm Beg. Jiyaneke dirêj. Keneke
kurt. Axîneke dilsoj. Rûpeleke bi keder. Peleke zerbû-
yîû bi evînê neqişandî.
Belê, ew. Merivekî ziravbihfstiyar. Bi qayide û pren-
sîbên jiyanê perwerdebûyî; rindî, qencî, ji merivan
hezkirin, ji jiyanê hezkirin, evînwelatî, evîndarê evînê
bûyin, dilsozî, fedakarî, sebir, nefsbiçûkî... Qayide û
prensîbên jiyanê; helqên zîncîrekê. Zîncîrek ku bede-
na wî, mêjiyê wî pêçaye.
Xwediyê kevokên evîna qurmiçî. Xwediyê xewnan.
Xwediyê gotinên kin û kurt, lê xweş.
Ew; tava rojhelat, şewqa rojava, nivîskarên do û îroj,
medeniyeta do û îroj, şifr, pexşan, huner û musîk.
Dengê musîkê. Nemaze dengê kemançê; tray, trayy,
layyyy... Dengê avê, dengê jinan û dengê dil. U siyaset.
«Jîn... jînê, digel her tiştîjî tu dîsan xweş î.»
Lêv, bi ken, dilivin. Çav h dora xwe dinihêrin. Mem-
duh Selîm Beg li otêlê, li der û dora xwe dinihêre.
Roniya lampan li ser lêvên wî yên bi ken dilîzin. Ah-
yekî rûyê wî di bin siyê de ye. Çermê qermiçî yê rû di-
hve. Li ser bîbûkên çavan jî bi dehan, bi sedan fikir.
Çav baş nabînin, fêrê çavan roj bi roj, kêmtir dibe.
Rûyekî weha dewr û dewran dîtî çi nabêje! Li milekî
meraq, li milekî jî aramî. Li milekî kîbarî, li milekîjî

bêhuzuriya dil. Li milekî bawerî, li milekî xem ûşik. Li
193

milekî bihêziya zanîn û tecruban, li milekî bêhêziya derd û kulan. Li milekî bextiyariya jiyîna jiyanê, li milekî jî birîndariya dil.
Belê, dilekî bi keder û birîndar. Dilekî ji mirazan bi dûr. Dilekî kal.
Sal bihurîn. Wextê, dîsan jî, wekî xwe kir; dilê Memduh Selîm Begê şewitan, pişta wî xwar kir, porê wî spî kir û berçavik xist ber çavên wî. Gelek dost û hevalên wî çûn rehmetê. Ew yên mane jî hêdî hêdî derin. Di nav kesên çûyî de du kesên ku şopên kûr di dilê wî de berdan; bavê wî û Celadet Alf Bedirxan. Belê, ev her du merivên ku li ber dilê wî yekta bûn, jî çûn rehmetê. Celadet Alî Bedirxan di 1951 an de, bavê wî jî 1953 an de çûn rehmetê.
Wext diherike, dewr diguhere. Guherînên nû tên pê. Memduh Selîm Beg jî gihîşt payiza umirê xwe. Sal ber bi 1960 an hildikişin, umirê wî jî ber bi jêr dadikeve. Ew ber bi welatê ebedî ketiye rê.
Ji 1940 an û vir ve, salên bihurîn, kêm, zêde, vekhev bûn. Salên şêt, mirdar û xirab... Dinya kal û malkambax şerekî din yê dijwar jiya. Bi milyonan ketin ber pêlên şerê û çûn. Niha jî dinya birînên xwe radipêçe. Di jiyana Memduh Selîm Begê de guherînên cîddî nebûn. Wî salên bi hesret, kahr û jan bihurandin...
Hesret, qahr û jan; sê sitûnên esasî yên payiza umirê

Memduh Selîm Begê.
Ew, bi hêdîka, radibe pê. Hevalê ku ew dipê, tê. Ermenekî; krikor Mazlumiyan. Xwediyê Hotel Baron li Helebê. Dostekî kevn yê Memduh Selîm Begê. Ew carina tê ba wî û çend rojan li otêla wî dimîne.
Her du bi hev re, li salona otêlê rûdinin.
«Monsieur Memduh, em kal dibin...»
Kal, kahtî, kalbûn... peyvên ku Memduh Selîm Beg,
194

roj bi roj, hîn zêdetir dibihîse.
«Belê, mîrê min... wekî her tiştî, wekî her kesî, em jî kal dibin.»
Bi fransizî. Bi ken, lê bi keser.
«Hema li otêlê binihêre. Ka ew rojên kevn? Ka ew rojên ku Werner Otto von Hentig, Wilhelm Wasmus yên aleman, Lawrence yê îngiliz li vê salonê rûdiniştin û siyaseta duwelê dipeyivîn?.. Di dawiya 1930 an de, nivîskar Agatha Christie dihat. Oda wê li qata jorîn bû. Ew sibê zû radibû, li balkonê xwirîniya xwe dikir û paşê jî dest bi nivîsînê dikir. Ka ew roj, monsieur Memduh, ka?..»
2
Odeyeke Hotel Baronê. Li Helebê. Li koşa odê textekî fireh, ji bo du kesan. Du mase, çend kursî, h ser dîwaran lewhe û tablo û balkoneke fireh. Odeyeke ronî. Li ser maseyekê xwarin û vexwarin. Bê guman, araq
J1-

Li ser textê du kes. Memduh Selîm Beg û jineke es-
mer, xweş, bedew.
Gava daxwaza bedenê li Memduh Selîm Begê tê xe-
zebê, ew xwe davêje otêlên Şam, Heleb û Beyrûdê. Mi-
xabin, ew nikare xwe h ber daxwaza bedenê ragire.
Nabe. Daxwaz dilê wî, mêjiyê wî dihejîne. Daxwaz dilê
wî dîl digire. Ruhê wî dikeve nav newalên bêbinî. Hin-
gê ew dil dike bedena xwe bigihîne nik bedeneke nerm,
bedeneke din h nik bedena wî dirêj be û her du beden
bi hev re yek bin...
Li Şam, Heleb û Beyrûdê dostên wî henê; ermen,
yewnan, îtalî, fransiz, tirk. Ew daxwaza bedena wî da-
dixînin, tiya goştê wî dişkînin.
Niha jî h oda Hotel Baronê, dosteke wî ya ermen be-
195

dena wî ya kal hembêz dike. Bedeneke nerm û germ li
ser bedena wî strana hez, coş û şehwetê dibêje. Memi-
kên stûr û ciwan pirçên sînga wî radimûsin. Lêv h ser
rûyê wî digerin. Destên narîn porê wî, bedena wf mist
didin. Berzik, qudret û quweta ecêb agireke nedîtî da-
dixe dilê wî. Dengin xweş, dengên hezkirin û şehwetê
besta wî digihîne spêdên zewkê.
«Tu çi xweşik î, tu çi rindik î...»
Di nav coşa nalînê de çend peyv. Çavên wî girtî ne.
Wî xwe daye ber pêlên şehwetê. Bîhna beden, sîng, stû
û gerdana keçikê ew sermest kiriye...
Memduh Selîm Beg li vê derê, bedena xwe teslîmî

bedeneke narîn dike, bi bîhna yekbûna bedenan ser-
sem dibe, ji zewk û heyecanê difire. Lê belê, mêjî jî ber
bi alîkî din difire; ber bi Ferîha'yê. Ber bi Xezala na-
rîn. Ew li wê difikire û wê xeyal dike. Wekî ku bedena
wî bi bedena wê re yek dibe. Wekî ku ev bîhn bîhnên
bedena wê ne. Wekî ku ev germî ji bedena wê radibe.
Wekîku ew xwe berdide nav kûrahiyên wê...
Ew rojên Antaqiyayê ku wan xwe dabûn bin siya e-
vînê, tê bîra wî. Wî kincên wê jê dikirin, h bedena wê
ya tahzî dinihêrî, bedena wê ya nerm mist dida, her a-
liyê bedena wê radimûsî û bi germî û daxwaza bedena
wê difirî.
«Bedena te çi xweş e, çavên te çi xweş in, porê te çi
xweş e, hêtên te çi xweş in. Tu xweşikê, axxx tu...»
3
Şam. Taxa Muhacirîn. Li ser kaşa taxê maleke kevn.
Du qat, du ode û hewşeke hûr. Di hewşê de bîrekê. Li
kêleka dîwêr çend darên gulan. Dîwarên ji kevirên reş.
Qata jorîn oda razanê. Qata jêrîn kitabxane.
Warê Memduh Selîm Begê. Piştî ku wî ji Antaqiyayê
196

bar kir, ew hat û li Şamê bi cîh bû. Wî li Şamê jî, heta
demeke dirêj, mamostetî kir. Paşê wîdevjê berda. Ni-
ha, destpêka 1960 an, ew teqawît e.
Ew çi dike?
Ew dê çi bike? Ew dikare çi bike? Ew li mal e, pir
kêm ji malê derdikeve. Ew li mal, di nav kitêbên xwe

de ye. Gava ew derdikeve der jî, ew dere nik heval û dostên xwe. Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa, Rûşen Bedirxan û gelek kesên din jî di vê taxê de rûdinin. Ew hevûdu dibînin. Ji hevûdu pê ve, tu kesên wan tune.
U tiştekî din; Memduh Selîm Beg hê jî xebata xwe ya siyasî didomîne. Hê jî peywendiyên wî yên siyasî hene. Lê bê guman, ew hêvî, şewk û heyecana 1920-30 an nemaye. Ji wan rojan tiştê ku ew pir meraq dike, kite-kitên şoreşa Agirî û serpêhatiyên Ihsan Nûrî Paşa ne. Şoreş têkçû. Ihsan Nûrî Paşa û pîreka wî xwe spartin bextê Iranê û ew niha li Tehranê dijîn. Lê belê, Memduh Selîm Begê tu carî keys nedît ku bûyerên têkçûnê û rewşa Ihsan Nûrî û xanima wî bizanibe. Wî û Ihsan Nûrî Paşa, ji wê rojê pê ve, tu caran hevûdu nedîtin. Ew wan meraq dike.
Ferîha venegerî. Ew hê jî li Urdinê ye. Birîna Memduh Selîm Begê sax nebû. Ew her diêşe. Ew hê jî h hêviya hatina Ferîha'yê ye.
Memduh Selîm Begê ku tu carî nedixwest bi tenê bijî, hê jî, tenê dijî. Memduh Selîm Begê ku mal, jin û zarok dil dikir, di vê payiza umirê xwe de jî, bi tenê xwediyê kitêban e. Kitêb bûn zarokên wî. Ew her xebitî ku dinya bibe dinyayeke çêtir. Wî xwe westan ku jiyan hîn çêtir be. Lê niha, di payiza umirê xwe de, ew pê dihese ku jiyana wî bi xwe dere.
Wî xwend, pir xwend. Wî dil kir ku pir tişt hîn be, pir tişt bizanibe. Ew bi klasîkên kurdî, rojhelat û roja-
197

vayê mezin bû. Di salên zanîngehê de jî, wî nivîskar û feylesofên nûjen xwendin. Ew bû hevalbendê kitabxanan. Li Parîsê, li odeyeke pir biçûk û sar, di bin ronahiya çirayeke jar de, wî çand û edebiyata fransizî hîn çêtir nasî, şoreş û medeniyeta Fransê hîn çêtir hîn bû. Kitab, kovar û rojname h ber serê wî riziyan. Li Galatayê, di nav dengên qahpik û serxweşan de, wî serê xwe bi siyasetê û teoriyên siyasetê êşand. Li Antaqiyayê, cîhê ku bîhna wî lê derdiket, kitabxana wî bû. Wî nedixwar, kitab dikirîn. Wî venedixwar kovar dikirîn. Wî li xwe nedikir, rojname dikirîn. Ew li ser riya zanînê bû derwêş, bû dîn.

Lê mixabin, hezar mixabin... Ev xîret, zanîn û ked ji derdê evînê re nebûn çare. Digel evçend zanînê, wî dermana birîna evînê nedît.

Niha jî, ew li kitabxana xwe rûniştiye û van tiştan dinivîse. Wekî nameyekê. Ji dostê xwe yê gorbehîşt Celader Bedirxan re.

Belê, ji Celadet Bedirxan re.

Memduh Selîm Beg her hefte ji sê kesan re name dinivîse. Ji sê kesên mirî re; bavê wî, Celadet AlîBedirxan û Ferîha. Roja sêşemê, piştî nîvro ji bavê xwe re. Roja çarşemê, piştî nîvro ji Celadet Alî Bedirxan re. Roja pêncşemê, piştî nîvro jî ji Ferîha'yê re. Gerçî Ferîha nemiriye. Gerçî Memduh Selîm Begê hê jî hêvî heye ku Ferîha dê vegere. Lê bi alîkariya nameyan, ew pê re dipeyive, wê bi bîr tîne.

Mixabin ku Memduh Selîm Beg ne nivîskar e. Eger wî bikaribûya, wî dê romanekê li ser evînê binivîsa. Romanek ku bi kêfxweşî û serfirazî diqede, evîndar digihên mirazên xwe û dibin mesûd. Lê ew nikare tu romanan binivîse. Di dewsa romanan de ew name dinivîse. Bi vî awayî, ew bi xwe re û bi qedirgirên xwe re di-
198

peyive.
«Belê, mîrê min... evîn û sewda dînîtiya herî mezin e. Lê dînîtiyeke welê ku meriv bê wê jî nabe...
Mîrê min, ez jî li rê me, ber bi te têm. Di demeke kurt de, ez li nik te me. Li hêviya min be...»
4
Destpêka 1965 an. Rojeke şilî. Li der baran dibare. Iroj kêfa Memduh Selîm Begê di cîh de ye. Wî ji xwe re desteyek diran dane çêkirin û îroj roja yekemîn e ku ew wan bi kar tîne. Ew bi ken e. U di ser de jî, ew îroj henekî dike. Tiştekî ku meriv zû bi zû lê rast nayê.
Ew li mala Qedrî Cemîlpaşa wan e. Ew û Qedrî Beg di oda rûniştinê de, li dor maseyeke raxistî rûniştine û vedixwin. Wekî her carî; araq. Lampayeke stûr ji jor ronahî direşîne ser masê û rûyên wan. Li paş Memduh Selîm Begê, li dîwêr xalîçeyeke xweşik, bi dest hûnandî, dixuye. Li ser xalfçê sê siwar li ser hespên kihêl in. Libasên neteweyî li wan in û di destên wan de jî tifing hene. Hesp, du spî, yek belek, wekî lehiyekê diherikin. Li pey siwaran jî çiya, dar û hêşinahî dixuyin. Berge-

heke xweş. Bergeha azadî û serbestiyê.
Memduh Selîm Beg jî îroj xwe azad û serbest hîs di-
ke. Derd, kul û keserên ku her lê tên xezebê, îroj jê bi
dûr ketine.
«Mîrê min, tu dizanî çima ji araqê re araq tê gotin?..
Ez bi xwe jî baş bi vê yekê nizanim, lê li gor gotinan,
ew ji peyva araqî ya erebî tê. Yanê xwîdan. Yanê ve-
xwarina ku meriv pê xwîdan dide. Tiriya bedew û şê-
rîn kiras diguherîne, dikeve nav şûşê, di nav qedehê de
bi avê reng diguherîne, dibe spî û gewriya me dişewitî-
ne. Gewrî ewçend dişewite ku meriv xwîdan dide...»
Araq, vexwarina araqê, rewşa kurdan, nezanî, dijîtîû
199

berberî, hukimeta nû ya ereb li Sûriyê, hal û hewala
dost û hevalan, rewş li Turkiyê û li Kurdistana Iraqê û
hwd... Tiştên ku di şeveke weha de tên peyivîn, pir in.
Bê guman, şeveke weha xweş ji bo gotina daxwaza di-
lên hevalên wî jî fersend e; Memduh Selîm Begê zewac
divê.
«Memduh Beg, tu hew dikarî bi tenê bihewî. Sal der-
bas dibin, êdî em dibin kokim... Tu divê bizewicî. Ji-
nek divê h mala te be, li te binihêre, xwarin û vexwari-
na te hazir bike, nivînê te germ bike û şevên te ji tenê-
tiyê xelas bike. Xanimên pak û delal pir in. Tu divê bi
yekîre bizewicî...»
Memduh Selîm Beg çi bibêje? Umir gihîşt dawiyê.
Miraz şikestin. Evîn winda bû. Rewşa malkambax hat

qebûlkirin. Taxa Muhacirîn bû taxa payiza umirê wî û herweha taxa wî ya dawîn li jiyanê. Welat bû xeyal. U niha jî, piştî van tiştan zewac. Zewaceke ku ji evîn û evîndariyê pir bi dûr e.

«Mîrê min, êdî zewac bi min nakeve, ji min re nabe. Meriv carekê dijî... carekê tê dinê, carekê mezin dibe, carekê li ser jîna xwe biryar dide, -tevf rastî û çewtiyan, carekê kal dibe û carekê dimire... Min piraniya van tiştan bihurandin û li pey xwe hîştin. Tiştê ku ez divê niha bikim, li hêviya mirinê bûyin e. Ne zewac... Em çawan bikin! Qedera min jî weha bû. Eger yek ji ew nameyên ku min ji Agiriyê şandibûn, bigihîşta cîh, niha ez jî zewicî û xwediyê zar û zêç bûm. Eger hevalekî ji we xwe bigîhanda çiyê, eger rê li min nehata girtin, eger Ferîha û dê û bavê wê nelezandina, eger edet û toran çavên Ferîha'yê kor nekirina, dîsan, ez niha zewicî bûm Lê nebû... Em çawan bikin?»

Xwezî «eger»ên ku ew behs dike, bihatina cîh. Xwezî her roja wî bi evînê bihata neqişandin. Xwezî dax-

200

waz û mirazên wî nequrmiçîna û jiyana wî bibûya bergeheke rengîn. Lê ew niha, di payiza umirê xwe de, baş dizane ku jiyan ne bergeheke rengîn e û ne jî şênahiyeke bêdawîn e. Ew dizane, li hember jiyana sedsala bihîstan her û her kemîn hene... heye ku di ser de jî, jiyan bi xwe bûye kemîn.

Mixabin, piştî evçend lez, bez, xebat û keda salên di-

rêj, wî kemîn qebûl e.
Lê belê, ew naxwaze îşev, şeva xwe bi xeberdanên weha bibuhurîne. Ew dixwaze îşev kêfa gurê Manço bike.
«Mîrê min, dev ji zewacê berde. Tê bîra te, gava em li Stembolê bûn, em diçûn Beyogluyê û li wê derê me malên yewnanan zîyaret dikirin? Ew çi keçên spehî bûn! Tê bîra te, şevekê, ez, tu û çend hevalên din çûn malekê. Digel ku me pere tunebû. Li wê derê me têr xwar, vexwar, kêfa xwe kir, bi keçan re man û paşê jî destê sibê, em ji wê derî revîn... Tê bîra te?.. Haa, haaa haaa...»
5
Şeveke bihara 1966 an. Antaqiya. Li ber qeraxa deryayê. Li asmên, heyveke gulover û stêrkên çirûsî. Heyveron. Şewqa heyvê li ser avê. Dengê avê...
Li qeraxê ew; Memduh Selîm Beg.
Ew bi pasaporteke sexte hatiye deverê xwe yê kevn. Ji bo cara dawîn. Ji bo xatirxwestinê. Tu kes wî nenase. Ji heval û dostên wî, ji nasên wî tu kes nemane. Her tişt guheriye. Di dewsa mala wî ya kevn de, niha, apartimaneke stûr dixuye. Di dewsa mala malbata Ferîha' yê de, niha, parqeke zarokan heye. Di dewsa meyxana ermenan de, niha, pasajeke navnetewî û di dewsa bexçê Zîrahî de jî, niha çend karxane dixuyin.
201

Kalemêrê porspî Memduh Selîm Beg hatiye bajarê

xwe yê kevn. Ji bo bibîranînê.
Ew hemû roj li bajêr geriya û bi bîr anî. Çi û kê?
Rojên xwe yên kevn û wê, Xezalê.
«Min dengê kemança wê ji vê derê dibihîst... Cara yekemîn min ew li vê malê dît... Mala min li vê derê bû û min deriyê malê jê re vekir. Ew û bavê wê dihatin vê derê... Dîsan rojeke weha biharê bû, gava ew û diya xwe hatin bexçê... Gava bav û diya wê rnirin, evjîhat vê malê... Kî dizane, lingên wê yên narîn çend car pê li van kolanan kiriye!.. Eger em bi hev re bizewiciyana, min dê li vê taxê xaniyek bikiriya... meyxana ermenan li vê derê bû û li meyxanê ez bi bavê wê re h ser zewacê peyivîm... Li vê derê qahwexaneyek hebû ku ez û bavê wê diçûnê... Xwendegeha ku min û bavê wê tê de ma-mostetî dikir, li vê derê bû...
Ew jî niha li vê derê bûya û em bi hev re bimeşiya-na!..»
Ka, ew roj li kû!..
Memduh Selîm Begê careke din ji Ferîha'yê re xeber şand ku ew were. Lê ew nehat.
Niha jî, ew li ser riyeke nû ye; riya zewacê. Belê, ew dê bizewice... Di dawiya dawîn de, hevalên wî ew razî kirin ku -qet nebe- payiza umirê wî bi tenê derbas ne-be. Wan jê re jinebiyekê dîtin. Jinebiyeke çerkez. Ew çûn û bi jinikê re peyivîn, jinik jî razî kirin. Di demeke kin de, ew dê bi hev re bizewicin.
Lê belê, berî zewacê, Memduh Selîm Begê dil hebû were Antaqiyayê. Pêşî Antaqiya û di nav xatirên kevn

de rneşîn, paşê jî zewaca edetî.
Antaqiya tu carî, bi Memduh Selîm Begê evçend xweş nehatibû. Antaqiya îşev wekî bûkekê xemiliye. Bajar û kolanên bajêr di nav ronahiya lampayên elek-
202

trîk de dilîzin. Dengên xweş ji bajêr radibin. Pêlên deryayê dengên bi dûzan tînin pê. Dinya germ û hey-veron e. Li asmanan jî ken û lîstika stêrkan heye. Stêrkên nazdar Leyl û Mecnûn jî di nav koma stêr-kan de duxiyin. Yek li rojhelat, ya din li rojava. Ji hev-ûdu dûr. Ew li hev dinihêrin û dibişirin. Evîndar nagi-hên hevûdu. Tim û tim, yek h milekî, yê din jîli milê din.
Memduh Selîm Beg jî li wan dinihêre û dibişire. Bi keser. Kelgirî. «Xwediyo!.. Çima tu weha dikî? Çima te ev neheqî qebûl e? Çima tu evîndaran, van stêrkên delal nagihînî nik hevûdu?..»
6
Şeveke payiza 1966 an. Li mala Memduh Selîm Be-gê. Qata jorîn. Cîhê razanê, textê wî yê fireh. Di de-rengiya şevê de du meriv. Kalekî û pîrekê. Memduh Se-lîm Beg û Wîldan Xanim. Şeva wan ya yekemîn. Bi hev re. Piştîzewacê. Mêr ûjin.
Li ber serê wan, li ahyê Memduh Selîm Begê, li ser masê çireyekê. Di bin ronahiya jar ya çirê de du bede-nên pîr. Her du jî porspî. Memik, hêt, sîng, zik û stûyê çelmisî yên Wîldan Xanimê. Bedena biçûk û qermiçî

ya Memduh Selîm Begê. Bîhna bedenên pîr. Heyecana yekbûna bedenên pîr. Her du jî şermok û bêdeng. Li nik hevûdu dirêjbûyî. Destên wan di destê hevûdu de. Zewaceke weha! Bi dû 25 salan re Wîldan Xanim careke din dizewice û li nik mêrekî dirêj dibe. Tahzî, bi best û daxwaz. Ji bo Memduh Selîm Begê jî, ev cara yekemîn e ku ew dizewice, dibe xwediyê jinekê... Zewaceke ku bi daxwaz û xîreta heval û dostan hatiye pê. Zewaceke ku ji tirsa tenêbûn û bi tenê mirinêhatiye pê. Memduh Selîm Begê dil tunebû ku bizewice. Wî di-
203

xwest her û her h hêviya evîna xwe bûya. Heta mirinê. Lê heval û dostan gelekî zor danê. U di ser de jî ji Stembolê, ji xwişka wî nameyeke dirêj li ser mesela zewaca wî hat. Xwişka wî dixwest bila ew bizewice û wê dil dikir were û birayê xwe ziyaret bike. Ev name bû dilopa dawîn. Wî hew xwe ragirt... û bi çerkezek re zewicî. Ne bi Xezala çerkezan re, lê bi çerkezeke din re.

«Wîldan Hanim hoşgeldiniz...»

Memduh Selîm Beg, bi tirkî, lê xêrhatin dike. Weha bêdeng di nav nivînan de dirêjbûn nabe. Memduh Selîm Beg dipeyive, jê re behsa umirê xwe yê dirêj dike. Wan, Stembol, Ewrûpa, Stembol, Kurdistan, Misir, Sûriye, Antaqiya, Şam. Di nav çend peyvan de umirekî dirêj. Dostên wî, hevalên wî. Xwişka wî, ezîza ber dilê wî. Jiyana wî ya Şamê. Rojên wî. Kitêbên wî. Bîr û

baweriyên wî. Biryara zewacê... her tişt bi çend qisan, bi kurtebirî.
«Me serên xwe danfn ser bahlîfekê. Em divê li hev xwedî derkevin, rêz û rêzdariyê kêm nekin, bibin heval û hogirên hev...»
Belê, amanca vê zewacê; heval û hogir bûyin. Ne e-vîn. Ne agirên evînê. Ne ew taya dijwar. Ne dînîtiya sewdayê. Lê heval û hogir bûyin.
Xeberdan alîkarî dike. Bedenên wan hîn bêtir nêzîkî li hev dikin. Germiya bedenên pîr hîn bêtir diguheze hev. Wîldan Xanim destê xwe dibe ser sînga wî û sînga bêpirç mist dide. Hêdî hêdî. Çermê bedena Memduh Selîm Begê wekî çermê bedena zarokekî nûjidayikbûyî nerm e. Paşê dest, hêdî hêdî, ber bi jêr dibe û li ser zik û bi dû re jf li ser berzik digere. Tilî di nav pirçên ber-zik de digerin. Lê li wê derê tu jiyan tune. Jiyan li wê derê vemiriye.
204

Dil pihêt hildavê. Ew destê Wîldan Xanimê digire û datîne ser sînga xwe û bi xwe jî, bi destan, wê hembêz dike.
«Bedenên me dê hevûdu, hêdî hêdî, binasin. Hêdî hêdî, Wîldan Xanim...»
«Belê, Memduh Beg, tu rast dibêjî.»
7
Wîldan Xanim; jineke rûpak, bejndirêj, porspî, xwenda û ji maleke dewlemend hatî. Berî 25 salan mê-

rê wê yê çerkez bi nexweşiyeke xedar dimire. Wîldan Xanim; rûpela nû ya jiyana Memduh Selîm Begê.
Di demeke kurt de ew hînî hevûdu bûn. Her du jîji tenêtiya şevên tarî rizgar bûn. Ew bedenên xwe yên pîr digihînin hev û şevê bi germiya bedenan tijî dikin. Ew bi hev re dipeyivin, derd û kulên xwe ji hev re dibê-jin. Lê ji derdekî pê ve; Memduh Selîm Beg tu carî behsa Ferîha'yê û evîna xwe nake. Wî biryar daye, tu kes nikare dewsa Ferîha'yê bigire, tu kes nikare nêzîkî lê bike. Cîhê wê kûrahiyên dilê Memduh Selîm Begê Wî dest pê kiriye, ji nû ve, porê xwe yê weşiyayî şeh dike, kincên xwe yên xweşik û kirasên xwe yên spî li xwe dike, pêlavên xwe boyax dike û hîn bêtir hevalên xwe dibîne. Wîldan Xanim lê dinihêre; şîva wî çêdike, serê wî dişo, kincên wî dişo, li dora wî wekî perwane-yekê dere û tê.
Lê îroj, bi dû zewacê re heft meh, tiştekî nû qewimî. Memduh Selîm Begê Ferîha, dîsan, dît. Li mala Qedrî Cemîlpaşa wan. Dîsan ew bi tayê ket, dîsan dilê wî ji qefesa xwe derket, dîsan axîn jê rabû, dîsan hêstir ji çavên wî gêr bûn. Ji lewre, Ferîha vegeriyaye. Ji binî ve. Mêrê wê Edib Aswar wefat kiriye. Wê jî dev ji Ur-
205

dinê berdaye û hatiye Şamê, nik merivanên xwe. U Qedrî Cemîlpaşa jî dil kiriye ku ew hevûdu bibînin. Wan hevûdu dîtin, çend gotin ji hev re gotin û paşê jî xwe ranegirtin û li nik şênî giriyan. Wan li hev nihêrî û

giriyan... Wan dê ji hev re wekî din, çi bigotina? Ew ca-
reke din li ber siûda xwe ya xirab ketin. Memduh Se-
lîm Beg evçend sal li hêviya wê sekinfbû, wexta xwe bi
xem û xeyalên wê bihurandibû, li hember wext û xe-
zeba wextê şer kiribû. U di dawiyê de, gava tixûbên
navbera wan li ber rabûnê bû, hingê Memduh Selîm
Beg zewicîbû. Edî ne Memduh Selîm Beg, ne jî Ferîha
teqet hebû ku behsa evîn û yekbûnê bikirana...
Iroj jî yek ji wan rojên xedar e. Bîhn li Memduh Se-
lîm Begê çikiyaye, wekîku ew divetise. Wîxwe, ji ker-
ban, avêtiye kuçe û kolanên Şamê, gopalek di destan
de digere.
Lê kes, tu kes hawara dilê wî nabihîse.
8
Name ji Ferîha'yê re. Bi tirkî, bi tîpên erebî.
«Canim Ferîha, ev bû demekê ku ez ji te re name
nanivîsim. Piştî hevûdudîtina me ya dawîn, min taqet
nebû ku ez rahîşim penûsê. Bi gotineke din, birîneke
nû di dilê min de vebû. Lê ez hê jî li ber xwe didim...
Xwezî min tu, cara dawîn, nedîta. Tu bi qasî mistekê
mabûyî. Tu ji min jî pîrtir dixuyayî... Ez çi bibêjim?
Min jîna te herimand. Tu nebûyî xwediyê mal, zarok û
jîneke baş. Ne tu û ne jî ez, em di vê dinya malkambax
de nebûn mesûd û bextiyar. Evîna me xweş, paqij û ze-
lal bû. Ew bi me re bû, li nik me bû. Lê mixabin, ji ber
dînîtiya min, me xwe gîhand ber siya we. Bi tene ber
siya wê. Ne wê bi xwe.
Ez niha li ser riya koça dawîn im. Jîna min bû koçe-

ke bêdawî. Lê niha, êdî ez digihêm dawiyê. Tiştekî heye ku tu divê pê bizanibî; ez çawekirî derim...»
Name ji Celadet Alî Bedirxan Begê re. Bi fransizî, bi tîpên latînî.
«Mîr'ê min'ê ezîz, birayê min'ê axretê,
Tu dibînî, jîn çi bi me dike? Ez hê jî li vî aliyê dinê me, hê jî ji te bi dûr. Lê zêde nema. Te hinekî din jî sebir divê. Ne zêde. Pir caran ez li te, li jîna me difikirim. Ev çi jîn bû? Me çi kir?.. Gava ez li jîna xwe vedigerim û lê dinihêrim, ev tişt tê ber çavan; ez jiyîme. Min pir çewtî kirin, min dilê hinan ji xwe hîşt. Min dilekî zelal û reben hûr hûrî kir. Lê tu carî min ji qayide û prensîbên jîna xwe rû baneda. Min bi zanîn, tu carî, xirabî nekir. Min bêbextî nekir. Min sextekarî nekir. Min derew nekirin. Min zordarî nekir. Ez ji bo xelkê xwe yê belengaz xebitîm. Min xwe kir berdevk û kolê wî. Ez hê jîji bo wî dixebitim û lawê wî me.
Belê, rast e, jîna min, jîna te bi derd, keser, kul, dijwarî û zehmetiyan derbas bû. Lê ez bawer im, tu jî wekî min difikirî. Eger em careke din bihatina vê dinya malkambax, me jîneke weha, dîsan, qebûl bû. Bê guman, me dê hewl bida ku çewtî zêde nebin. Em dê, dîsan, xwediyê eynî qayide û prensîban bûyana...»
Name ji bavê xwe re. Bi tirkî, bi tîpên erebî.
«Bavo,.. Ez nizanim ev nama çendan e ku ez ji te re dinivîsim. Namên ku min ji te re nivisîne, li vê derê, li

nik min in. Ew bûn çend tomar. Ez wan wekî çavên xwe diparêzim. Ji 1923 an û vir ve, me hevûdu nedît. Mixabin, bêyî ku em hevûdu bibînin, tu çûyî rehmetê. Ez jî niha ber bi we têm. Ez jî h mirinê difikirim. Ruhistîn li dora min dere û tê. Lê Ruhistîn min natirsîne. Herwekî yekî navdar gotiye; ez hatim dinê, min dît, ez jiyîm û ez derim.
207

Xwînga min li Stembolê ye. Ew zewicî û niha xwediyê çar zarokan e. Haya me ji hevûdu heye. Em ji hev re dinivîsin. Wê dil hebû were Şamê. Lê mixabin dewletê pasaport nedayê. Min pir bêrî lê kiriye. Herwekî ku min bêrî li te kiriye.
Bavo, min gotinek heye; tu dikarî, bi rehetî, bi Memduhê xwe serbilind bî. Memduhê te jiya. Eynî bi dilê te. Jînê, dinê çi dayê, wî wergirt. Wî bîhn kir, tahm kir, hîs kir. Derd û keser jê kêm nebûn, lê wî dizanîbû ku meriv ji bo guherînan e û meriv bi xwe tarîxa xwe dihûne, U guherîn û tarîx jî tu carî bê derd û keser nabe. Nabe.
Ma gul bê sitirîh dibe?..»
9
«Kal, nexweş, jar
Bi derd û kulan tijî,
Westiyayî,
Jiyaneke dirêj, tarîxeke dirêj, tecrubên dewlemend li pey,

Kitêb;jiyana wî, dewlemendiya wî, her tiştê wî...»
Memduh Selîm Beg, kovar di destan de, dibişire. Sal 1972. Nivîskarekî kurdê Iraqê li ser wî nivîsareke dirêj nivisiye. Ew nivîsara li ser xwe dixwîne. Bi dengekî berz. Ji nivîskar û lêgerekî hollandî re. Nivîsar bi erebî ye, lê ew wê ji lêger re werdigerîne fransizî.
Mala Memduh Selîm Begê bûye celebek ziyaretgeh. Nivîskar, rojnamevan, lêger û ronakbîr tên, pê re dipeyivin, jê tiştine dipirsin, li kitêb û kovarên wî dinihêrin. Ew niha bûye tarîx. Tecrubên wî, tiştên ku wîjine, niha, bûne tarîx. Kitabxana wî bûye şahîda demên rabirdû. Wan, qetliyama ermenan, Stembol, komela HEVI'ye, kovara ROJI KURD, teşkîlata Kûrt Tealli
208

Cemiyeti, kovara JIN'ê, partiya XOYBUN'ê, serîhildana Agiriyê û hwd... niha bûne babetên lêger û kitêban. Memduh Selîm Beg bi dest dipeyive, bi qasî xwe, ronahî direşîne ser tarîxê û dixwaze bîr û baweriyên serok û rêberên wê demê biguhezîne nifşên nû.
«Ev yeka muhîm e, monsieur. Tarîxa dewletên cîran di derheqê kurdan de, li ser derewan ava bûye. Ew ne rast in. Meriv divê nêrîna kurdan jî bigire da ku bigihê encameke, observationeke objektive.»
Nivîsar behsa wî, jiyana wî û kitêbên wî dike. Qedrî Cemîlpaşa Beg bi navê «Doza Kurdistan» kitêbek nivîsiye û tê de, bi firehî behsa wî dike. Lê belê, ne bi navê Memduh Selîm, bi navê Iskender Beg. «Hey gidiyo!..

Iskender Begê Xoybûnê, Iskender Begê çiyayê Agiri-
yê...» Akademiya Kurdî li Iraqê ew kiriye endamê şe-
refê. Serokên nû yên tevgera kurd tên û wî ziyaret di-
kin. Gelek rêkxistinên çandî, civakî û siyasî wî diezi-
mînin civîn û konferansan.
Bi dû salên dijwar re, ev qedir û qîmetgirtin wî kêf-
xweş û serfiraz dike. U ev yeka nîşan dide ku cefa û e-
ziyetên ku wî û hevalên wî xwarine, vala neçûne û ji
bîr nebûne. Lê mixabin, kêfxweşî û serfirazî dereng
hatin. Ji lewre ew niha ji jiyanê bêtir li mirinê difikire.
Bêyî ku ew baweriya xwe ya esasî ji dest berde.
«Monsieur... doza kurdan bi heq e. Neheqî li kurdan
bûye. Ev neheqî dê ji holê rabe, mesela kurdan dê hal
be û kurd dê mafên xwe bigirin. Me nikaribû... Di de-
ma me de «pouvoir et connaissance» di nav kurdan de
pir kêm bû, welat nû perçe bûbû, xelk ji hev ketibû,
conflit pir bûn, îmkan kêm bûn, dewletên din h me
guhdarî nedikirin û hwd... Lê îroj hem rewş û hem jî
dinya guheriye. Kurd dê di welatê xwe de azad û ser-
best bijîn. Bê guman...»
209

10
1974. Rojeke germ ya havînê. Roja biryareke nû.
Memduh Selîm Beg textê xwe yê razanê dibe kitabxa-
na xwe. Wîldan Xanim dê h jor, li ser textê fireh razê.
Ew jî li jêr, li ser textekî biçûk. Ew bi hev xweş in. Ew
dizanin, jiyana wan ya yekbûyî dê heta mirinê dewam

bike. Heta mirana ku li ber derî ye.
Memduh Selîm Beg dil dike, mirin wî di kitabxanê de bigire, Ruhistîn ji nav kitêban derkeve û were. Ew vedigere nav zarokên xwe. Ew li dinya rengîn ya kitêban vedigere. Dinya kitêban ku ji bo wî deriyê her tiştî bÛ.
Niha jî ew dinya dê bibe deriyê axretê. Memduh Selîm Beg dê derî veke û here.
210

Li SER RiYA KOÇA DAWIN

1976, payiz.
Koç. Bi dû payiza jiyanê re koça dawîn. Koçeke bêdeng, bêpejn. Koçeke rengîn, xweş, bê lez û bez, bê teşqele, bê westan û xwîdan... Koçeke xweş h gor daxwazên dilên xweş. Koçeke li gor mirazan.
Memduh Selîm Beg.
Kalemêrê hûr Memduh Selîm Begê Wanî koç dike. Li ser textê xwe dirêjbûyî. Çawekirî. Rûken. Lê belê, ker Ûlal...
Oda kitêban, oda dinyayên sihêrîn dibe warê koçê jî. Li odê her tişt wekî xwe ye; refên kitêban, kitêb, kovar û rojname, textek, qenefeyek, çend kursî, maseyeke biçûk, lewhene.
Wîldan Xanim, pîrejineke îmam ku Qur'an dixwîne û sê xort. Ew jî h dor Memduh Selîm Begê civiyane. Li

milekî Memduh Selîm Begê pîrejin, h milê din jî Wîl-
dan Xanim. Xort jî li pê. Çavên Wîldan Xanimê li wî û
devê wê jî li ber guhê wî ne.
«Memduh Beg hişyar be, devê xwe veke...»
Lê Memduh Selîm Beg ne hişyar dibe û ne jî devê
xwe vedike. Wî dest bi koça xwe kiriye.
Ew li ser riya koçê rastî newaleke kûr tê. Na, ne bi
her awayî newal. Carina newal, carina qelaşeke zina-
ran, carina pireke şikestî û carina jî wekî porê keçekê.
Aveke boş dixuye. Av pir pihêt diherike. Ji derina, ji
qelaşan şelale ber bi jêr dibin. Tîrêjên tavê h ser avê û
şelalê şewq didin. Rengên zer, şîn û kesk ketine nav
hev. Lê deng tune. Memduh Selîm Beg şaş dimîne. Ev
ava boş, ev şelala gur çawan weha bêdeng diherikin?
Gelo ew av û şelale ne? Ew ne avdayên dirêj, zer yên
porekî bedew in? Gelo ew ne por be ku wekî lehiyeke
boş diherike û diçirûse?.. Memduh Selîm Beg fahm na-
ke. Di nav wê kûrahiya newêl de, hûnikahiyeke xweş jî
213

heye. ew pê dihese û pê sermest û fereh dibe û dikare
çêtir nefes bigire. Niha jî di nav avê de masî dixuyin.
Masiyên têkel. Masiyên ku wî qet tu carî nedîtine. Ma-
sî cot bi cot xwe dilivînin û gava ew xwe dilivînin, ew
bi rengekî zêrîn dibiriqin. Lê masî jî reng û şekil digu-
herînin. Carina ew masî ne, carina jî wekî cotên ça-
van... Xwediyo, ev çi koçeke nedîtî ye ku tê de tu tişt
baş û zelal naxuyê!..

Lê belê, Memduh Selîm Beg ji koça xwe razî ye. Eş û jan tune. Qahr û keser tune. Xem û endîşe tune. West û xebat tune. Ked û xwîdan tune. Memduh Selîm Beg li ser textê xwe dirêjbûye û tişt, wext, cîh, bûyer, meriv û heywan û rawir bi ser wî re tên. Bi awakîsakîn, bêdeng, bêteşqele û bê xire cir.

«Wîldan Xanim, eger hûn dixwazin, ez herim bang bijîşkekî bikim... lê ez ne bawer im ku bijîşk bikaribe bigihê ser. Halê apê Memduh ne baş e... Mixabin ew li ber mirinê ye.»

Wîldan Xanim destê Memduh Selîm Begê pêdigire û diguvişîne. Ji girtin û dayina nefesê pê ve, ew ji wî tu bersîvê nagire. Ew jî baş têdigihê; halê Memduh Selîm Begê bêhêvf ye... Ew destê xwe davêje ser eniya wî. Enî germ e.

Taya mirinê. Taya dawîn. Bi dû taya hêviyê, taya welatê xerîbiyê, taya evînê, taya bêkesî û bêgaviyê, taya bêhêvîtiyê re, niha ji taya herî dawîn...

Rûyê wî sakîn û hinekî jî bi ken e. Tu êş û jan h ser rû naxuyin. Lê rû biçûk bûye. Ew bûye bi qasî mistekê. Rûyekî biçûk, neçar û reben.

«Ew dê here rehmetê... mala minê!..»

Wîldan Xanim hêdî hêdî dest bi girînê dike. Xort jî pê re. Bêyî ku ew bizanibin Memduh Selîm Beg çi jiyaye, ji serê wî çi derbas bûne. Ew dizanin ku Memduh

214

Selîm Beg kurdekî xebatkar û cefakar bûye, pir xebiti-

ye, pir tişt dîtine û jiyaye. Lê ew nizanin ka çi...
Memduh Selîm Beg jî dil tune ku ew ji koça xwe vegere û ji wan re bide zanîn. Di koça yekta de, ew niha dikeve derekî ku agir jê radibe. Deverekî seranser sor. Na, carina sor, carina kesk. Li her alî agir. Wekî hûtan. Bi xezeb û xof. Deryayek ji êgir. Gelo ev çi dever e? Ew dûjeha ku di kitêban de hatibû nivisîn û qal lê dibû, ev der e? Agir û deverê ji agir nêzîkî li Memduh Selîm Begê dike. Ew rûyê xwe jê banade. Ew, bi çavên vekirî, dikeve nav êgir. Heyret... Tu germî tune. Na, carina heye, carina tune. Carina germ, carina hûnik. Ew agirê xopan ku her kes jê ditirse, ev e? Ew di nav gulokên êgir de, hêdî hêdî, digere. Na, ew nagere, difire, hem difire, hem digere. Agir. Agirî?.. Gelo ev gulokên êgir ne darên çiyê ne? Ev keskahî ne hişinahiya çiyê ye? U ev hûnikahiya ku ew carina pê dihese, ne hûnikahiya zozanên çiyakî serbihnd be?.. Ew tênagihê. Tişt û cîh reng û şekil diguherînin. Ew jî pê re dere, bêyî ku fahm bike...
«Kesekî wî jî nema ku tova wî bidomîne. Ne zar, ne zêç. Bi tenê xwişkeke wî heye. Lê ew jî li Turkiyê, li Stembolê ye... Memduh Beg, Memduh Beg, çima te h xwe weha kir?.. tu bê şop û eser derî, deriyê xaniyê te tê girtin, ocaxa te vedimire. Çima, çima?..»
Nalîn. Hêstirên çavên Wîldan Xanimê. Kezebxuriya xortan. U di nav bi hezaran nas û dostan de, bêkesiya Memduh Selîm Begê.
Tîrêjên tavê ji pencerê diçirûsin û di oda nîvtarî de, li

erdê, ronahiyeke gulover tînin pê. Tîrêj di navbera pencere û erdê de wekî sitûneke zêrîn dixuyin. Toz û gemariyên biçûk yên odê jî di nav sitûna zêrîn de dilî-zin.

215

Dinya malkambax rojeke germ ya payizê jî li rojên xwe yên bêhejmar zêde dike. Rojeke wekî rojên din; bi keft û left, bi hêsir û ken, bi qencî û xirabî, bi xêrhatin û xatirxwestin... Memduh Selîm Beg jî di vê roja germ ya payizê de, xatir ji haziran û ji dinya malkambax di-xwaze û koç dike. Ew dev ji dinya teşqele û bûyeran berdide û dere dinya xewnan. Evîndarê xewnan dere deverên nexuyayî yên xewn û xeyalan. Ma jiyana wî bi xwe jî ne xewneke dirêj bû?.. Xewneke dirêj ku tê de kes, bûyer, deng, hîs û pejn hebûn. Xewneke dirêj ku carina tahl û kirêt, carina jî xweş û dilşad bû...
Jiyaneke dirêj di babilîskeke nexweş û şêt de. Babi-lîska har! Sedsala daf û nêçîrê! Sedsala kemîn û tirsê! U tiştê ku niha li pey her tiştî maye; rûyekî bêçare, ka-lemêrekî biçûk, bi qasî mistekê û dilekî bêkes.
Belê, dilekî bêkes.
Niha jî daristaneke rengîn. Memduh Selîm Beg, li ser riya xwe, daristaneke hûr û li nik daristanê jî çend xa-niyên biçûk, lê xweş dibîne. Li pey daristanê jî av di-xuye. Di navbera daristan û xaniyan de du kes. Ne me-zin, du zarok. Kurekî û keçek. Destên wan di destên hev de. Kirasekî spî li lêwik û kirasekî rengîn jî li keçi-

kê. Pêxwas. Ew dilîzin, lotikan davêjin. Porê keçikê yê dirêj difire. Bihar e. Her cîh di nav hişinahiyeke nûveji-yayî de ye. Zarok dikenin. Rebiyo! Rebiyê xweşiyan... Memduh Selîm Beg dike, nake, nikare zarokên kêf-xweş binase. Ew kî ne? Digel ku zarok pir nêzîkî wî ne, dîsan jî, ew wan nas nake. Bi qasî bîskekê, ew li wan dinihêre. Bi dil û can. Bi kêfxweşî. Lê paşê, zarok jê bi dûr dikevin. Hêdî hêdî. Zarok winda dibin. Na, ew winda nabin, lê di nav daristanê de, h pey darine xwe vedişêrin. Lîstik. Lîstika dinya zarokan ya pak û delal. Piştî demeke dirêj, zarok, dîsan, dixuyin. Ew
216

hêdî hêdî nêzîkî li Memduh Selîm Begê dikin. Lê ew niha ne zarok in. Na, ne zarok! Du kesên mezin. Keçe-ke xort û bedew û mêrekî navsal. Kincin reş h mêrik û fîstaneke dirêj û hewreşîm h keçikê. Destên wan di destên hev de. Rûyên wan bi ken. Ew dilîzin û lotikan didin xwe. Wekî zarokan. Gelo ev merivên mesûd kî ne, ji kû ne?.. Rûyên wan ne xerfb in, lê Memduh Se-lîm Beg jê dernaxe ka ew kî ne. Du merivên bextiyar di nav çîçek, kulîlk û hişinahiya biharê de. Rebiyo!.. Ew du kes li wî dinihêrin û dikenin. Lê bêdeng. Tu deng tune. Bi dû bîskekê re, ew destên xwe hêldikin, ji wî xatir dixwazin û derin dikevin xaniyekî spî ji wan xa-niyên biçûk. Ew wî bi tenê dihêhn û winda dibin. Memduh Selîm Begê bêkes.
Rengê wî bûye wekî rengê xweliyê. Wekî rengê bah-

lifa ku serê wî li ser e. Rîhê wî hinekî dirêj bûye. Por, rîh û simbêl wekî berfê spî ne. Carina lêva wî ya jorê û simbêlê wî yê zirav dilive, wekî ku ew dixwaze tiştekî bibêje. Lê deng jê dernakeve.

«Memduh Beg, binihêre, h vê sûretê binihêre. Min ew di nav kaxizên te de dît. Tu û çend hevalên te ne. Sal 1927 e. Hûn h Beyrûdê ne. Tu dikenî. Por, simbêl û çavên te dibiriqin... Xwezî min tu hingê binasiya! Binihêre...»

Li oda Memduh Selîm Begê, her tişt di nav neçariyeke dilsoj de ye. Feqîrî li her alî dixuye. Feqîrî, keser û janên salên dirêj. Di nav kitêb, kovar, rojname û kaxizan de tarîxekê. Tarîxeke kevn, birîndar û jibîrbûyî. Şahîdekî din ji şahîdên tarîxa kevn dere, koç dike. Ew kitêbên xwe, zarokên xwe li pey xwe dihêle û dere. Wî ew wekî zarokên xwe parastibûn, bi salan li wan miqayite bûbû, ew xwendibûn, di şevên dirêj û tenê de xwe avêtibû hawara wan, ji her kesî bêtir qedrê wan girtibû,

217

ji her kesî bêtir bi wan re bûbû heval û bi wan re peyivîbû... Lê mixabin, riyên wan, niha, ji hev vediqetin. Koça Memduh Selîm Begê koçeke welê ye ku meriv bi tena serê xwe dere. Meriv her tiştî li pey xwe dihêle û bi tena serê xwe dikeve rê. Çawan ku dinya malkambax û siûda wî ya reş ew bi tenê û bêkes hîştibû, niha jî, ew her kesî, her tiştî di dewsê de berdide û bi tenê dere.

«Memduh Beg, deqeyek... ez serê te rast bikim...»
Wîldan Xanim serê wî, bi hêdîka, radike û bahlîfeke
nû tîne û datîne bin serê wî. Di wê navberê de, zerfekî
biçûk ji bin bahlîfê dikeve erdê. Zerfekî biçûk û spî.
Lê zerbûyî. Kevn. Tê de çi heye?
«Memduh Beg, zarfekîji bin serê te ket...»
Deng nariyê. Wîldan Xanim zerfê vedike. Bi hêdîka.
Bi meraq. Xort jî bi meraq lê dinihêrin. Ji zerfê kaxi-
zeke biçûk derdikeve. U avdayeke dirêj. Belê, avdayeke
por.
Li ser kaxiz rêzine. Tev h hev. Bi tîpên pir hûr. Wîl-
dan Xanim nikare rêzên hûr bixwîne. Ferê çavan têr
nake. «Gurgîn, hele li vê kaxizê binihêre ka tê de çi ni-
visîye.»
Sê rêz. Bi kurdî. Bi tîpên erebî.
«Kurmanc di dewleta dinê de
Aya bi çi wechî mane mehrûrn?
Bîl cimle ji bo çi bûne mehkûm?»
Sê rêzên şa'îrê navdar ya sedsala hufdan Ehmedê
Xanî. Ji tarîxa kurdan dengekî. Pirsiyara esasî ya tarî-
xa kurdan; «Bil cumle ji bo çi bûne mehkûm?» Pirsiya-
ra ku kurd, bi dirêjahiya sedsalan, nikarin bersîv bidi-
nê.
218

Sê rêzên tarîxî; kurtebiriya jiyana dirêj ya Memduh
Selîm Begê.
«Heyra, ev çi ye, ev çi qise ne? Çima Memduh Begê

ev nivisîne û parastine?..»
Çima... Kî dê bizanibe ku hemû jiyana Memduh Selîm Begê ji bo bersîvdana vê pirsiyarê bihurî û çû. Kî dê, niha, bizanibe ku ew çawekirî, bêbersîv û bêmiraz dere. Kî dê bizanibe ku ew, her gav, li pey bersîva xebat û jiyana xwe bû...
Sê rêzên sedsala XVII an; wesiyeta Memduh Selîm Begê. Bi dû sê sed salan re eynî pirsiyar. Di sedsala har û lez û bezê de jî eynî daxwaz û hîs.
«Ev avda?.. Ev çi ye? Ev ya kê ye?.. Belê, belê... ya xwişka wî ye. Wî ji xwişka xwe pir hez dikir, her gav qala wê dikir... Heyf, pir heyf... Wî pir dixwest xwişka xwe bidîta. Ev avda divê ya xwişka wî be. Mala minê!.. Memduh Beg, mêzeke, em li vir in, ez û ev xortên ku te jê hez dikirin. Em giş li vir, h nik te ne. Tu ne bi tenê yî...»
Avdayek. Avdayeke dirêj wekî têlekî hewreşîm. Avdayeke zer. Avdayeke dirêj, xweş û zêrîn. Avdayek ji rojên jibîrbûyî û wextên kevnare. Lê belê, nîşandeka bibîranînê. Avdayek ji porekî dirêj û spehî wekî lehiyên boş. «Avda divê ya xwişka wî be...»
Hey lê gidiyê qederê hey! Hey lo gidiyo mirazê kor hey!..
Kî dê, niha, bizanibe ku avda ji wan rojên xweş yên Antaqiyayê yadîgar maye? Kî dê bizanibe ku Memduh Selîm Beg bi taya evîna keçikeke bextreş ya çerkez ketibû?
Avdayek ji rojên bextiyar û mesûd. Avdayek; xatira

mayî ji evîneke ddsoj...
Di odê de wext rawestiye, naherike. Tîrêjên tavê h
219

ser pencerê dibiriqin. Ji derve dengin zîz tên. Jiyan, herwekî berê, li derve dewam dike. Zarok li kuçê dilîzin. Di odê de jî, ji pise pisa pîrejinê pê ve, tu deng tune. Kesên odê, bêdeng, li Memduh Selîm Begê dinihêrin. Ew jî li ser textê xwe, bêdeng, sakîn, çawekirî û stûyê wî li ser bahlîfê xwarbûyî, dirêj bûye.
Ew, ji dinya derve bêxeber, di nav xewn û xeyalên xwe de koç dike. Ew niha li deverekî, li ber pêlên spî yên aveke spî sekiniye. Pêl, bi lez, bi ser wî re tên. Ew natirse. Ji bervajiyê, ew kêfxweş dibe. Pêl tên û wî dadiqultînin. Ew niha di nav pêlan de ye. Her alî spî ye. Spiyeke xweş û dilgerm. Ew tî ye. Bi hêdîka, ew devê xwe vedike. Dev û gewriya wî tijî av dibe. Nefes lê diçike. Ew devê xwe digire. Tahm. Tahma avê ecêb e. Na, ew ne av e. Şîr e. Na, ne şîr e jî. Araq e. Ew carina av, carina şîr û carina jî araq e. Memduh Selîm Beg kêfxweş e. Bi destan ew çelpe çelp dike. Ew di nav pêlan de dilîze. Ew dîsan devê xwe vedike ku hinekî din av vexwe. Gewrî dîsan tijî dibe, nefes lê diçike.
Wîldan Xanim jî dibîne ku nefes h Memduh Selîm Begê diçike. Ji nişkekê ve, ew radibe pê û destê wî dixe destê xwe.
«Gurgîn, Gurgîn, Memduh Beg can dide!..»
Memduh Selîm Beg, bêhereket û çavên wî wekî kab

vekirî, li banê dinihêre. Nefes lê hatiye birîn. Xort jî dilezînin ser wî. Lê piştî bîskekê, ew dîsan dest pê dike û nefes digire. Hêdî hêdî. Kesên doralî li hev dinihêrin û dibişirin. Lê piştî çend nefesên pêşîn yên baş, dîsan, bîhn lê diçike. Ew dixwaze pihêt, pir pihêt nefes bigire û bide. Sînga wî radibe û dadike. Ev yeka, bi qasî çend saniyan, dewam dike, lê paşê, dîsan, ew giran dibe û nefes lê tê birîn.
«Çû rehmetê, mala minê, çû rehmetê!..»
220

Lê na, Memduh Selîm Beg, dîsan, dest bi nefesgirtinê dike. Icar hîn çêtir û bi dûzan. Lêvên wî vedibin. Lêv hêdî hêdî dihezin. Ew dil dike tiştekî bibêje. Lê nabe. Li eniya wî dilopên xwîdanê civiyane. Wîldan Xanim bi destmaleke spî eniya wî paqij dike.
«Bibêje, bipeyive Memduh Beg... xîret bike, tiştekî bibêje...»
Çavên Memduh Selîm Begê wekî ku ne yên wî bin. Wekî ku kesekî coteke çav danîbin ser kortika çavan. Ew ewçend vekirî û bêhereket in. Bi tenê ew li bana o-dê dinihêrin. Nêrîneke sabît û sakîn. U westiyayî. Pir westiyayî.
Lê belê, ew di koça xwe de, di nav pêlên ava spî de masiyeke stûr dibîne. Masiyeke stûr û zerik. Masî li dor wî dere û tê. Masî pir xweşik e, pûlên bedena wê dibi-riqin. Memduh Selîm Beg jê dernaxe ka ew çi celeb masî ye. Lê wî tu carîmasiyeke evçend xweşik nedîtî-

ye. Lê tiştê ecêb, masîjî şekil û reng diguherîne. Gava ew nêzîkî li Memduh Selîm Begê dike, ew masî ye, lê gava ew jê bi dûr dikeve, ew dibe keçikek. Keçikeke bedew, pordirêj û bedenxweş. Keçik jî dibiriqe. Memduh Selîm Beg kêfxweş e. Ne bi tenê kêfxweş, ew sermest e jî. Ne bi tenê sermest, serxweş e jî. Digel ku ava spî nefes lê diçikîne, ew xwe ranagire û carina devê xwe vedike û ava spî vedixwe. Masî li pêş, ew li paş, bi hev re, di nav pêlên spî de, ew derin. Masî rêberî lê dike. Bi qasî demekê, ew bi hev re derin. Paşê, ji nişka ve, deriyek li ber wan dixuye. Deriyekî pir stûr û neqişkirî, wekî deriyê keleheke stûr. Her du milên derî, hêdî hêdî, li ber wan vedibin. Masî li pêşî, ew li paşî, ew ber bi derî derin. Lê berî ku ew bigihên derî, Memduh Selîm Beg, dîsan, bi kêfxweşî, devê xwe vedike.
«Gurgîn, Gurgîn... Memduh Beg dere!..»
221

Rûyê Memduh Selîm Begê diguhere. Rûyê wî wekî xwehyê sor dibe.
«Em çi bikin, çi bikin?»
Tiştê ku meriv bike, nemaye. Her tişt êdî bêkêr e. Memduh Selîm Beg koç dike, dere. Devê wî, bi awakî ecêb, vedikişe. Ew dixwaze nefes bigire, lê nefes lê tê birîn. Çavên wî niha hîn bêtir vekirî ne. Ji devê wî tu peyv dernakeve, digel ku ew dil dike. Edî qefesa sîngê jî ranabe. U xire xir pê dikeve. Xire xir dewsa nefesê digire. Xire xireke nerm. Wekî ku ew, merivê nerm û

ziravbihîstiyar lawan bike û xatir bixwaze.
Bi dû xire xirê re jî bêdengiya ebedî. Ne nefes, ne deng, ne peyv, ne pejn û ne jî hîs. Perda bêdengiya ebedî bi ser her tiştî de tê kişandin. Her tişt wekî xewneke şevê, ji nişka ve, winda dibe. Bi tenê bêdengiya ebedî dimîne.
Bi tenê bêdengiya ebedî.
222

A
A
PIRTUKEN WEŞANXANA ORFEUS
ORFEUS YAYINLARI
Mirina Kalekî Rind, Mehmed Uzun
Çîrokên Kurdî, Roger Lescot
Gundikê Dono, Mahmud Baksi
Textên Kurdî, Stig Wikander
Rêzana Zimanê Kurdî, Kamran Bedirxan
Şanoyên Kurdî, Memo Yetkin
Kiirt Ulusal Hareketleri ve Ermeni Kirt llişkileri, Garo Sasuni
Kûrdistan Tarihinde Dersim, Nuri Deraimi
NAVNIŞANA XWESTINE
ISTEME ADRESÎ
ORFEUS BOKFORLAG
Vanadisvagen 18, 2TR.
113 46 Stockholm
Sweden

Mehmed Uzun, 1953, ji Kurdistana Bakûr e. Piştî cunta eskerî li Tirkiyê, 1970, ew hat girtin. Bi qasî du salan, ew li girtîxanên Diyarbekir û Ankarê ma. Di sala 1976 an de, gava kovara Rizgarî dest bi weşînê kir, Mehmed Uzun bû berpisiyarê kovarê. Ji ber vê yekê jî ew hat girtin û 8 meh li girtixanê Ankarê ma. Di dawîya 1977 an de, ew hat Swêdê û li wir cîwar bû. Li Swêdê, wî berpirsiyari-ya kovara Rizgariya Kurdistan'ê kir, 1979-81.
Siya Evînê romana Mehmed Uzun ya sêyemîn e. Romana wî ya yêkemîn Tu di sala 1985 an de û romana du-wemîn Mirina Kalekî Rind ji di sala 1987 an de derketin.
ISBN 91 87074 16 8

NAVNIŞANA XASTINE
iSTEMEADRESÎ
ORFEUS BOKFÖRLAG
VANADISV. 18, 2TR.
113 46 SROCKHOLM - SWEDEN

"Sal 1922. Pencereyek û merivekî li ber. Kî?

Rûyekî gulover, çavên reş wekî komirê, porê kin û şehkirî, eniyeke fireh, guhên stûr, bîvi-leke xweşlihevhatî, simbêlê zirav û lêvên ken-tijî. Kî'? Bejna zirav, kincên xweş, qiraweta hewreşîmî û dûmana cixarê. Kî? Fikir û guman, bîr û şik.

Kî?.. -

Memduh Sêlîm. Ronakbîrê kurd, bîrewerê gelê bindest û evîndarê xweşiyan Memduh Sêlîm Beg. Nivîskar û berpirsiyarê kovara Jîn'ê Memduh Sêlîm Begê Wanî...

Iskender Beg?

DelaHyê bav û kalikê xwe. Xortê bejnzirav yê bajarê kevn û rengîn Wanê. Efendiyê xortên kurd yên Stembolê. Pêxasê meyxanên Galata-yê. Dilovanê dengên xweş. Hosteyê araqve-xwarinê. Yek ji damezravanên Komela Xwen-dekarên Kurd li Stembolê, Hêvî, 1912. Nivîs-kar û berpirsiyarê kovara/m'ê. Yekjidamez-revanên rêxistina kurdî Teşkilat-î Içtimaiye. Aware û derbederê welatê xerîbiyê. Dildarê evînê. Xwediyê kevokên aşqê. U niha jî yek ji damezrevanên Partiya Xoybûnê...

Ronakbîrekî nûjen di navbera rojhelat û roj-ava de.

Yanê Memduh Selîm Beg.

**

SORÊ GULÊ

www.nefel.com
info@nefel.com
NEFEL

Sorê Gulê
1
SORÊ GULÊ

2 SORÊ GULÊ

Sorê Gulê
SILÊMAN DEMIR
NEFEL
Stockholm
2002
www.nefel.com
info@nefel.com
3
SORÊ GULÊ

Silêman Demir: Sorê Gulê
Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden
www.nefel.com
info@nefel.com
© Silêman Demir û Nefel
Çapa dîjîtal: 2002

ISBN: 91-89687-02-7
Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan
Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.
Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4 SORÊ GULÊ

Delalê mino,
gava bi xêr tu bê
ez ê dernekevim ser xênî
û sê dengên bilind nelîlînim
ez ê biçûk û mezinên taxê
bi hatina te nehisînim
lê ez sozê didim
heta ko tu bê
ez ê hemû maçên ji dev û lêvan
ên ji herdu hinarkan
ji te re hilînim.
Hinek ji nama Gulê
Wêneyekî jînê
Êvareke dawiya payîzê bû. Roj gihabûn ko baş kin û şev jî baş dirêj û tarî bibin. Hîna ne qeşa ketibû, ne jî berfa pêşî. Lê gava rojê carnan serê xwe bi şermokî di nav ewran re derdixist, ji rengê wê yê çilmisî û dûrbûna wê xuya dibû ko zivistan nêzîk bûye, êdî li ser rojan e. Nema ne tu germ û ne jî tu tahm tê de mabû. Êdî wek rohniyeke ji dûr ve bû, wek stêrikeke mezin bû.

Dinyê zûtir di vê yekê derxistibû; piraniya daran gihabûn ko pelên xwe zer bikin û biweşînin. Gava ba radibû, hin ji ên mayî jî bi ber diketin û diweşiyan. Di bin nigên mirov de dibû xişt xişta wan û mirov ji rewşa dinyê haydar dikirin. Êdî payîza pîr bû. Dinyê, xwe ji rojên dijwar re kar dikir. Jîna sirûştê sist bûbû, êdî wek lebat û nerînên pîreke sedsalî bû. Lebata wê bi hêdî û xemgînî bû, wek a bedeneke extiyar û westiyayî bû. Wek ko dinya ji ber kul û kovan û xemên bi jan û êş, bêdeng rawestiyabû. Lê jîn û lebata mirovan bi xwe, hîna jî wek berê bû, hîna jî geş û germ bû, li gor darê havînê bû.
Êvara rojeke wilo, ji rojan şemî bû, şahiyeke dîn û jîndar li saloneke ji hezar salonên bajarê Stockholmê li dar bû. Dinya sayî bû û baş hênikbû.
5
SORÊ GULÊ

Stockholm mest û geş bûbû. Ezman bi stêrikan xemilî bû. Li hêla bakur her heftên Ursa Mayor -bi navê din Hirçê- diçirisandin.
Lebata bayekî nerm û dilovan di hewayê de hebû. Jîn û seyran xweştir dikir. Gazin jê nedibûn. Ber derî û hewşa avaniya bilind, ji mêvanên şevê yên ko nû dihatin dagirtî bû. Bi koman hildikişiyan salona şahiyê.
Lê li wir, dîlanê ji zû ve dest pê kiribû, bi awayekî dîn geriyabû û her ko diçû mezintir dibû. Wê êvarê, mêvanan, ji xêrê re hinekî zêde kêf dikirin û dikeniyan. Xwedê dizane, ji zû ve mecala kêfê û dilgeşiyeke wilo nedîtibûn, buhurtibûn. Şeveke bêhempa bû, ne wek tu şevên din bû, pir guhertî û şa bû. Ne şeva pîrozkirina tiştekî taybetî bû. Ji dekorasyon û birêvebirina wê jî xuya dibû ko ne fermî bû. Hew şeva şahiyê bû, ji bo xweşkirina dilan bû. Tiştê ko di salonê de serdest bû, dilgeşî û azadiyeke mirovane û bêhempa bû.
Xwarin û vexwarin jî hebû. Hinan ji mêvanan bi malbatî bîra, şarab û

tiştên din vedixwarin û heta ko ji wan dihat kêf û ken li xwe pirtir dikirin, dil û canê xwe geştir dikirin.
Li hêla din, dengbêjan klam û tembûrvanan jî tembûr xweş dikirin, dîlan xweş digerandin. Mêvan dilgeş û dilşa bûn. Dengê dîlanê di salonê hilnedihat; şeva ker li derve jî hildiweşand, şiyar û geş dikir. Zarok, pîrek, zilam û naşî di dîlanê de tev li hevdu bûbûn, xwe li ba dikirin û dihejandin. Qîz û xortan di orta dîlanê de mil dabûn hevdu û dîlan xurttir dikirin. Geh dadixistin û geh jî radikirin. Geh bi pêş ve dianîn û bi nigan diçûnê, û geh jî vedikişiyan û xet rast dikirin. Dengê ken û kêfê bilindtir dikirin û digihandin hemû guh û dilan. Em hemû wek xwe dilgeş dikirin. Em tev zarokan li ser hev, pêncsed kes hebûn. Gelekan hemû kul û xemên xwe ji bîra kiribûn û kurmên salan ji xwe dadiweşandin. Dîlan, carnan jê, gelekî mezin dibû. Şev û şahiyên Kurdan wilo ne û gelek ji mêvanan bi malbatî ne, dîlan ji dil û can in.
Ew dera ko Kurdan, dîlan, ken û dilgeşî wek dema agirê hêtûnekê bi gurînî lê diçe, bi heraret lê lidar xistibûn, ne restaurantek bû, her rojê ne wilo bû, lê cîhekî ji bo tiştên wilo jî bû, cîhekî bedew bû. Saloneke baş mezin bû. Îdara çandî ya bajêr xwediya wir bû. Kê bixwesta şahiyên xwe li wir bikin, karibûn wir bigirin, li gor dilê xwe bixemilînin.
Dikeke wir a ji bo pêşkêşkirinên şanovanî û musîkî hebû. Perdeyeke sor xwe ji jor ve, nuvaze bi du teniştên wê ve berdida heta jêr. Spehîbûneke bêhempa dida wir. Gava hewa ji ber bayê ko di pacan re dihat û lê dixist, ya jî gava hin di ber re diçûn û ew hêdîka dihejandin, pêl

ji jêr ve lê diketin, bi jor ve hildikişiyan û hêdî hêdî wenda dibûn. Herdu dîwarên du teniştên salonê û mirêka li pişt mêvanan, bi berhemên hunerî xemilandî bûn. Her berhemekê, li gor xwe nîşaneke serbilindiya dewle-

mendiya jînê û çanda mirovatiyê bû û spehîbûneke hunerî ya cuda bû. Gava mirov nû diket wir, êdî mirov bilindî, xweşî, estetîk û dewlemendiya jînê bi çavên serê xwe didît.
Li ser dîwarê tenişta rastê, peykerên her babet karmendan hebûn; bi bêr, das, bivir, çakûç û melhêb bûn. Dadgêr û mamoste û xwendevan jî bi pirtûk bûn. Li tenişta çepê jî, peykerên pîrekên tazî hebûn. Hin ji wan tenê bûn, raketî bûn û spehîbûna pîrekî, di huner de radixistin rastê. Hin ji wan jî bi ber û zarok bûn. Ew tiştikên biçûk û şêrîn, bi pûteyî girtibûn ber himbêza xwe ya `germ û nerm` û diyar dikirin ko pîrek ji destpêkê ve dêya mirovan in, kaniya hezkirinê û jînê ne. Yekê ji ên paldayî, şerbikekî avê, ya jî belkî yekî şarabê bû, girtibû ber himbêza xwe û mirov gazî xweşiyên jînê dikir.
Li ser mirêka pişt mêvanan, heta texma rasta serê mirovan, seranser bi wêneyekî jînê hatibû xemilandin. Renga reng bû. Her babet kar û lebata ji bo jînê û mirovên ko wan karan û wê lebatê dikin û bi rê ve dibin, tê de hebûn. Karkir, gundî, dadgêr, doktor, pîrik, leşker, siyasetvan, mamoste û xwendevan bûn. Wêneyê jîneke geş û dewlemend bû. Xuya bû ko aşîtiyeke ji xeterê dûr li wir lidar bû.
Aşxaneke wir hebû. Deriyê wê, ji wê mirêka ko bi wêneyê jînê xemilandîbû, vedibû. Ne ji bo çêkirina xwarina pir, a şahiyên wilo mezin bû. Ji bo a siviktir û heger ko biqewimiya, servîskirina xwarina pirtir bû.
Sê deriyên mezin ji salonê, ji dîwarê tenişta rastê vedibûn salona pêş. Salona pêş, ji ber deriyê pêşî dest pê dikir û dirêj dibû heta rasta dawiya salona mezin. Li wir, li ber deriyê salonê yê yekem û yê ko ji derve tê wir, bareke vexwarinê jî hebû. Gava pewîstî pê derbiketa, bedew bû. Wek herfa »L« bû. Gava şahiyên wilo mezin bi dengê dilgeşiyê yê bilind li salona mezin digeriyan, ew der bêdengtir bû. Wê şevê jî wilo bû. Hin ji mêvanan li wir li ser nigan rawestiyabûn û ya qise dikirin, ya jî bîra

vedixwarin.
Salona ber wê barê, ji ber gelek sedeman vala nedima. Hin jê nû dihatin, hin jê ji bo kişandina çixarê derdiketin, hin jê li hevdu sekinîbûn û diaxivîn û hin jê jî dihatin, vexwarin ji xwe re dikirîn û dîsa diçûn. Ez ji bo kirîna bîra çûm ketim dorê. Ji xwe çîroka ko ez ê bibêjim, li wir dest pê kir. Li ber barê, li aliyê çepê zilamekî navser, ji sisyan pareke porê wî sipî bû,
7
SORÊ GULÊ

-dor sîh û pêncan, çilî bû- wek çend kesên din rawestiyabû û bîra vedixwar. Hîna pir hindik ji bîra di destê xwe de vexwaribû. Tenê bû. Ji rewşa wî, eşkere xuya dibû ko ne serxweş bû. Nû hatibû û ji bo vexwarina bîra li wir rawestiya bû.
Piştî ko gulpek bîra vexwar, di ser stûyê xwe re fitilî, hinekî nerî û dîsa li ber xwe nerî, dîsa bîra xwe hilda û kir ko hinekî din jê vexwe. Lê gava devê xwe xist qedeha xwe, ji nifşkê ve wek ko li pişt xwe hinên ko qet texmîn nedikir bibîne, dîtibûn, veciniqî û xiroşa şiyarbûna ji metel mayinê girt ser rûyê wî. Awir tûj kirin û bi lezê dîsa li pişt xwe zîvirî û nerî.
Li wir zilam, pîrek, ciwan, mezin û zarok hebûn. Ne diyar bû bê li kê dinerî. Lê piştî ko bîstikekê bi baldarî li wir nerî, awira xwe dîsa anî ber xwe. Serê xwe hêdîka berda ber xwe û bi awayekî dilşkestî hejand û bi dû re jî kesereke kûr veda, rîh û çena xwe mist da. Hinekî wilo ma û bi dû re destê xwe yê çepê kir nav porê xwe yê dirêj û ji ser eniya xwe bi paş ve avêt
û dîsa berê xwe da wir, dîsa li wir nerî. Wê carê baş nerî. Ji rewşa wî û xetên rûyê wî xuya dibû ko îcar ji bo esehîkirinê dinere. Bi dû re qedeha di destê xwe de danî ser barê û çû li ber jineke ko zaroka xwe di himbêza xwe de dixist xewê, rawestiya.

Jineke spehî bû, porê wê nîvzer û genimî bû. Çavşîn û şêrîn bû. Ew jî di temenê wî de xuyabû; belkî jî hinekî ciwantir bû. Jinik ecêbmayî mabû. Wek ko wê bîstika pêşî bi çavên xwe û dîtina wî qet ne bawer bû. Lê mêrik bi xwe, biryardar û bêşik xuyabû. Bi dilovanî dest bi axavtinê kir. Hevdu nas dikirin. Bê guman bû, naskirineke kevn bû. Min xwe nêzîkî wan kir û ez bûm guhdarê wan.
»Êvara te bi xêr, tu çawa yî, ma tu min nas dikî« mêrik got û destê xwe dirêjî wê kir.
Jinikê zaroka xwe avêt ser milê xwe, destê xwe xist nav destê wî û »Ooo, spas, êvara te jî bi xêr; wey li vê ecêba nedîtî... hewarê xweda, ma ez çawa
te nas nakim malava. Ev çi bextiyarî ye xwedêyo! Wey li vê ecêbê!... ez ê li vir li te rast bihatima! Îro? Tu hew hinekî sipî bûye, lê tu wek berê yî. Ma ez ê çawa te nas nekim malava! Min bihîstibû ko tu jî li vir î. Ma tu jî li vî bajarî dimînî?« got.
»Na, ez li bajarekî din dimînim, ez li vir mêvan im. Ez ji bo vê şahiyê hatime. Min qet texmîn nedikir... vaye îşev tu derketî pêşberî min« got û bi bextiyarî beşişî.
Jinikê, wek ko bibêje »ma ev jî dê bibûya, min ê tu ji nû ve bidîta« serê xwe daxist ber xwe, bi jêr û jor de hêdîka hejand, bi dû re jî hinekî li do-

ra xwe nerî û bi şik qeliqî. Wek ko ne li bendî dîtina wî bû. Çima bû, ew ne diyar bû, lê eşkere bû ko xwe ne di ewlehiyê de didît. Dîsa awira xwe bir ser çavên mêrik. Ji nû ve hat bîra wê ko divê destê xwe ji nav destê wî derxe. Destê xwe hêdîka ji nav destê wî kişand û serê xwe bi awayekî dilşkestî dîsa hinekî daxist û li ber xwe nerî. Lê ji lebata wê, ji kêf û kenê ko tenik girtibû ser dev û lêvên wê, xuya bû ko dixwest hinekî din jî li ba

wî raweste, qet nebe çend gotinên din jî bibêje û li çendikan jî guhdarî bike. Êdî hinek bêzarî û poşmanî jî li rûyê wê xuya dibû. Serê xwe hilda û bi awirên lêkolîneran, bi pirsyardarî û hinekî jî bi bêzarî li mêrik nerî. Dû re »ka ji min re bibêje bê ma te çima wilo kir« got.
Mêrik, bi dengekî xemgîn, »ne min wilo kir... felek xaîn bû... jîn wilo li serê me gerand û wilo bû« got û bê deng ma, li ber xwe nerî. Diramiya xuya dikir. Piştî ne bi gelekî, tavilê serê xwe hilda û bi bextiyariyeke wek deşta Mêrdînê bê serî û bê dawî, »tiştê çû, çû... nede dû tê gotin. Tu hîna jî delala min a bi tenê yî. Niha were... jîn niha ye... were em bigihijin miradê xwe... em dikarin niha bijîn...« got û dîsa rawestiya. Li jinikê dinerî. Jinik hinekî bi şik û tirs xuyabû, lê ew bi awayekî din bû. Ew ne wek wê bi şik û bi tirs bû, ew ne xemgîn bû. Ew bi hêvî bû, biryardar bû. Bextiyariyeke mezin bi giramgirî girtibû ser dev û lêvên wî. Qet venedişart. Pir birçiyê jinikê xuya bû. Û tiştê ko ji lebata wî dihat famkirin, ne birçîbûna wan salên dawî bû. Hinekî li dora xwe nerî û rengê wî tirş bû. Xuya dibû ko ji mirovên li dora xwe aciz bû. Dixwest ko wê bîstikê tenê bûna, bikarîba ew himbêz bikira û maçî bikira. Lê nedibû. Li pêş çavên hemû kesan nedibû. Êdî xetên rengê tirş di rûyê wî de kûrtir bûn. Lê gava berê xwe dîsa da jinikê, spehîbûna wê dîsa can da rûyê wî, ew rengê kereh ji rûyê wî çû. Dilgeşiyê, dîsa rengê xwe da rûyê wî. Xuya dibû ko tiştê dixwest bike, bi çavan dikir. Bi du awirên birçî, îcar jinik himbêz dikir, digivaşt, zirav dikir, dikir wek mûyekî û dixist dilê xwe. Ew di wir de ji ber hemû kesan vedişart û pê şa dibû. Bi awiran wilo dikir, lê bi dilê xwe jî dixwest ko wê bi rastî ji ber hemû kesan veşêre û bibe ji xwe re. Tavilê awira xwe hêdîka bi jêr de daxist û ji serî heta nigan li ser bedena wê gerand û dîsa hilda ser awirên çavên wê. Ew gelekî dixwest. Xwestina dilê xwe bi gotinan jê re tercume kir: »tu hîna wek berê spehî yî, tu wek berê ciwan û sor û kej î. Tu hîna wilo di dilê min de dijî.

Carê ew spehîbûna te dihat ber çavên min û ez bi şevan û bi rojan dîn dikirim û dikuştim. Min tu caran tu ji bîra nekiriye û ez ê nekim jî. Min bihîstibû ko tu li van deran î; ev deh sal in ko ez li van deran, bajar bi ba-
9
SORÊ GULÊ

jar bi dû te de digerim, lê mixabin ez îşev nû te dibînim. Çi qasî baş e ko ez îşev hatim vir û li te rast hatim. Ez naxwazim te dîsa wenda bikim. Ez hîna wek wê roja pêşî, wê roja ko ez û tu bi gotinên zimanê evînê ên pêşî, ên herî nerm û germ dibûn hêsîrên dilê hevdu, ji te hez dikim. Wer e, bibe a min, em îşev...«
»Ax ka raweste.... ka raweste!... bes bibêje... na ezîzê min, bes bibêje, êdî nabe. Ne ko ez jî naxwazim, lê nema dibe. Bawer be ez jî wek roja pêşî dixwazim, lê ez dîsa bi mêr im û zarokên min hene; ez ê çawa dev ji wan berdim? Em dereng ketine, nabe« jinikê gotina wî qut kir û pêşî bi hêrs û bi dû re dîsa bi nermî got.
»Ne dereng e, min tu û zarokên te hemû divin... were bibe a min... ne dereng e...«
»Nema dibe ezîzê min, ez dîsa bi mêr im, em dereng ketine, êdî nema dibe.«
Bi wê bersivê re, xemgîniyeke qalind girt ser rûyê wî. Çirûskên dilgeşiya dilê wî, nema karîbûn tê re derbas bibin û biçirisin. Ji xwe ji rewşa wî xuya dibû ko êdî pê re nema bûn. Qet venedişart ko dilgeşî û ken û bextiyariya di nava wî de mirine û nema karin di rûyê wî re bidin der. Xemginiyeke kereh, hişk û bi gincir li cîhê wan bejin dabû û mabû. Biryardarî ji ra-manên wî derketibû, şikê û bêzariyê li wir reh berdabûn. Ji nû ve îcar li zaroka li ser milê wê nerî, ji nû ve dît ko delala wî bi rastî jî a hinên din e. Dîsa êşeke dîn li kamaxê dilê wî rabû pîkolê û bi lapûşkên bi xwîn zîvar

zîvarî dikir. Devê birînan qelaşt û xwe berda nav goşt û canê bedenê. Xwe zû bi xwînê re gihand hemû deveran. Di rûyê wî re xuya bû. Êdî bûbû wek çiyayekî ko agirekî dîn hemû tiştên ko berê lê hebûn şewitandibûn. Ne jîn û ne jî hêvî lê mabûn. Rengê êşê, xemgîniya reş û kovana kereh girtibû ser rûyê wî. Milên wî daketî bûn. Gelo ji ber giraniya çiqase êşê û a çend salan bû. Wî û xwedê tenê ew yek zanîbûn. Dilê tije êş û kulên giran, êdî nîvkuştî bi sêpiya sêng û milên wî ve daliqandî bû.
Xweş tê bîra min, îcar, herduyan bêdeng li hevdu dinerîn. Bi kêrên tîrêjên awirên xwe, hêviya di dilê hevdu de dikuştin, rengê dilgeşiya li ser rûyê hevdu dikolan û diavêtin. Xemgîniya kereh wek dîwarekî ji pola dora wan girtibû. Dengê klama jîna dinya geş ji ser wan birîbû. Herduyan, di wê bêdengiya ker de, hinekî li hevdu nerîn, dû re awirên xwe hêdî hêdî ji ser hevdu birin jêrtir, birin ber nigên xwe û li ber xwe nerîn. Êdî li wan nigên xaîn ko demekê ji deman ew ji hevdu bi dûr xistibûn, dinerîn. Ne pir bi dostanî dinerîn. Tiştê ko xuya dibû, li wir, pirt pirta hêviya wan bû,

diperpitî, di sikrata mirina reş de bû. Didîtin. Lê taqeta wan a xelaskirina wê tune bû.
Jinikê, carekê duduyan serê xwe rakir, wek ko dixwest tiştin din jî bibêje, lê nedigot. Kesereke kûr vedida û serê xwe dîsa berdida ber xwe. Cara duyem serê xwe baş hildabû, rohniyê rast dabû rûyê wê; xuya bû ko du lib hêsir li ser herdu hinarkên wê diçirisin. Bi xemgînî digindirin ser dev û lêvên wê. Serê xwe, bi qasî ko tu kes nikaribin bibînin ko hêsir ji çavên wê diherikin, tewand nav bêdengiya ko wê û mêrik ava kiribûn û bi serê tiliya xwe ya girdê, bi dorê ji bin herdu çavan zuwa kirin. Bi dû re, tavilê serê xwe hilda û ji mêrik re got »tika dikim, bila dilê te ji min nemîne... ez dixwazim tu bizanibî ko heta ez li dinyê sax bim, tu delalê min î... heta

ko ez sax bim, tu li ser textê dilê min î... heta ko ez sax bim, ez ê te ji wir danexim, ez ê wir ji tu kesên din re vala nekim... heta ko ez sax bim, ew der hew cîhê te tenê ye... ez tu kesên din dernaxim ser wir... lê nema wekî
din dibe!.. tika dikim... niha, êdî pir dereng e«.
Mêrik, bi dû re, bi dengekî xemgîn, »ev îsal bîst sal in ko ez li te diger-im. Dilê min ê reben hîna tenê ye, tu heval û hogir nedîne. Ez li bendî te bûm. Ax! Ez ji bo te û bi dû te de ji mirinê vegeriyam, lê ez qet ne poşman im. Ez karim îro dîsa bikim. Hîna tu tiştek ji hezkirina ko wî çaxî ketibû dilê min, kêm nebûye. Kul û kovana bejina te, a wan çavên te yên wek bahra Wanê, a dev û lêvên te yên hingivî, hîna wek pizotên êgir di nava min de ne, sar nebûne. Min her dişewitînin. Ev îsal bîst sal in ko ez bi xeyala spehîbûna te dijîm û hîna hilm û bêhna te li ber pozê min e. Ax, min dilê xwe xweş dikir û digot, saeta ez wê bibînim, wê destê xwe bide min û bi min re bê çi devera ko ez bixwazim. Lê vaye nabe. Madem ko wilo ye, heta ko tu zarokên xwe mezin bikî, ji nû ve were bibe a min. Ez ê kul û hesret û hezkirina te û wan çavên şîn, bîst salên din jî di nava xwe de hilînim û li bendî te bimînim... heta ko em careke din hevdu bibînin... vaye vê carê jî nebû... niha, êdî di xweşiyê de bimine delala min... bi xatirê te!« got û sivik jê vekişiya.
Êdî pir eşkere, dilşkestî xuyabû. Ser di ber de û mil daketî bû. Dilê xwe yê nîvkuştî li ser darbesta ji piça hêviya xwe ya mayî kir û bêyî ko li bendî bersivekê raweste, bi gavên sivik di derî re derket û çû.
Jinik li wir bêcan û bêlebat mabû. Xwîna wê di bedena wê de sar bûbû. Kela girî wek pîvazeke malikşewitî di qirika wê de mabû. Ne diçû xwar û ne jî derdiket derve. Nema ne karîbû nefesa xwe bigire û ne jî berde. Hişê wê ji serê wê çûbû. Zingîn ji hundurê serê wê dihat, wek kewareke mêşan
11

bû. Tu tiştek ji hevdu dernedixist. Êdî di dilê wê de ko jîn sekinîbû. Ne tu dinya û ne jî tu mirov li dora wê hebûn. Her tişt xelas bûbûn û miribûn. Heta ko mêrik ji ber çavan ket, bi hesret û kovan bi dû de nerî. Çû. Êdî xeyala wî tenê li ber çavên wê mabû. Diramiya. Ma gelo xewnek bû! Ya na, çawa dikarîbû wilo bibe! Çawa dikarîbû dîsa wî bibîne û dîsa wenda bike! Çawa dikarîbû bi a dilê xwe neke û pê re neçe!
Dor deqîqakê wilo di cîhe xwe de bêlebat ma, hêsir ji ser hinarkên xwe zuwa kirin û di ber xwe de »hewarê xwedêyo... tu hinekî alîkariyê bi min bike... tu hinek hêza jînê têxe bedena min... min dîsa neke ew hêsîr û ew bendewara berê« got û ji wir çû hundur.
Dihejiya, dişewişî û çû wî cîhê ko dîlan wek hespekî kovî lê rabûbû ser herdu nigên dawî û qêrînên dilgeşiyê didan. Li wir, xelk bi kêfê û bi dîlanê daketibûn. Li wir girî û bêrîkirina dildaran, êşa birîndaran, bêzariya bêzaran û jan û xemginiya ko ji ber gelek sedemên din dikare bi-gire ser dilan, hemû ji bîra kiribûn. Xanî, bi hêza dilgeşiya jînê dihe-jandin. Deng û kenê dilgeşiya dilan, di wê salona mezin hilnedihatin, êrîşî nav bêdengiya derve dikirin.
Rewşeke gelekî balkêş bû. Tiştên ko herdu rebenan ji hev re gotin jî wilqasî balkêş bûn. Evîneke têkçûyî ew wilo hejar û dilkovan kiribûn. Bi salan êşa evînê kişandibûn.
Dilê min hinekî bi wan şewitî, min serê xwe berda ber xwe û ji xwe pirsî bê ma kul û êş di jînê de, têkçûn û bêmiradî di evînê de misoger in. Pêşî çîroka Memo û Zînê û hema bi dû re jî a Siyamend û Xecê hat bîra min. Ez hinekî di wan ramiyam. Min dît ko tiştên wilo dibin. Ew jî mirov in. Çîroka evîna Xwedaya spehî, Kalypsoyê hat bîra min. Di nava deryan de, li giraveke xamoş dima. Ne rêya tu xwedayên nemir pê diket û ne jî a

tu mirovên dinyayî. Tik û tenê bû. Lê rojekê ji rojan, qedera Odysseusê dinyayî ew avêt wir. Ji ber xezeba Zeus, ji nav pêlên deryan filitîbû. Kalypsoyê ew kir mêvanê xwe, jê hez kir, xwest ko wî bike mêrê xwe û yekî ji nemiran. Heft salan ew li ba xwe girt, di qesir û konaxên xwe de hilanî û danî, ew bi hingivê xwedayî xwedî kir û ket himbêza wî, lê miradê wê neçû serî. Ne wî jê hez dikir, ne jî Zeus razî dibû. Êdî ew efû kiribû. Sala heştan Zeus, Hermesê egît, ew Xwedayê ko Argos kuştibû şand ser û jê xwest ko wî berde, wî zû bişîne welatê wî. Nedibû ko li fermana wî guhdarî neke. Kalypsoyê, bê dilê xwe ew mêvanê ezîz kar kir, şand û dîsa li girava xwe ma tenê.
Ez di kul û êşên jînê ramiyam. Çîroka Helena spehî hat bîra min. Êşên
12 SORÊ GULÊ

ko didan dilê wê, wek ên birînên heft rim û heft tîran bûn. Hêsirên çavên wê, wek ava du çeman bûn. Kulên di nava wê de, bi qasî heft çiyan bûn. Pêlên bêrîkirina ko bi şev û rojan li dilê wê dixistin, wek ên ser dozdeh deryan bûn. Keça xwedayê mezin bû, lê ew jî însan bû.
Çîroka Thetîsa nigzîvîn hat bîra min! Xwedayeke deryayî bû. Di şkeftên zêrîn ên binê deryan de xatûna refên periyan bû. Lê Zeus rojekê ew da Peleusê dinyayî. Piştî ko Akhîleus jê re anî, dîsa şand binê deryan. Tiştê ko hatibû serê wê, bextreşiyeke mezin bû. Her demê dilê wê şkestî bû, bêzar bû û li ber xwe diket. Çawa ew xwedayeke nemir bû û Zeus ew dabû yekî dinyayî. Bi dû re lawê wê mezin bû û diçû şeran. Egîtê herî spehî û xurt bû ji Akhayan, lê zanîbû ko wê rojekê bê kuştin. Jê ve xuyabû. Ew jî kuleke din bû.
Min ji xwe bi xwe re, evîn û jîn wilo ne, tije kul û êş in, got. Min ji ber vê yekê herdu rebenên li şeva Stockholmê, hêdî hêdî ji bîra kirin. Ez neketim dû çîroka wan.

Lê li gor ko dû re hat bihîstin, piştî wê şeva şahiyê bi şeş mehan, îcar hevdu revandin û piştî revandinê bi mehekê jî, li jêra Norweçê, li kêleka Atlantîkê, di tirimpêlekê de hatin dîtin. Du namên kin di nav passaporta jinikê de hebûn. Yek ji wan li ser navê herduyan bû, ji hemû kesan re bû, eşkerekirina dilgeşiya gihiştina miradê wan bû. A din jî li ser navê wê tenê bû. A li ser navê herduyan, »Bila dil bi dil be, bila jîn hew meheke kin be« bû, a wê bi xwe jî, »Zarokên min, ez ji we hez dikim, min zû ji dilê xwe neavêjin. Çaxê hûn mezin bibin, hûn ê min fam bikin û efû bikin. Belkî rojekê ev çîrok jî ji serî ve ji we re bê gotin. Lê çawa jî be, hûn ê min efû bikin. Ez her aliyekî rûyê we, hezar caran maç dikim. Bi xatirê we« bû. Wilo bû. Ma gelo eşqa malikşewitî çi nayne serê xelkê!
Ez ji nû ve ketim dû bûyerê û min lê kola. Agahdariyên balkêş ketin destên min. Mêrik dixwest çîroka klama du bajaran binivîse. Tiştê ko ez jê derdixim, piştî wê şeva şahiya li Stockholmê dest pê kiribû. Li gor şema ko çêkiribû, wê çîrok, romanek bûya.
Destpêka romana wî wilo bû:
»1
Klameke li ser du bajaran
»Hey lo dilo hey lo dilo hey lo dilo,
ji ser ve sax o ji bin ve kul o«
13
SORÊ GULÊ

Deşta Mêrdînê, deşteke bi nav û deng e; buharan bi xeml e û bi reng e. Gava mirov ji Mêrdînê lê dinere, spehîbûneke bêhempa ye û heta ko çav bikaribin bibînin, ew heye. Li jêra mirov deşt, li jora mirov jî ezmanekî şîn heye. Herdu bi qasî hevdu ne, wilo xuyane. Herdu bi hevdu re pan dibin, fireh dibin û heta ko ji ber çavan wenda dibin diçin. Li cîhekî dûr,

li dera ko jê re aso tê gotin, li wê dera ko mij û moran heye, ezman daketiye, serê xwe di deştê çikandiye; ya jî, deşt bi xwe bi ezmanê şîn ve hilkişiyaye û serê xwe daniye ser kaba wî û xewa ko ji hezar salan de maye dike. Li wê dûrê, li wî cîhê ko mij û morana gewr bejin dide, deşt û ezman dibin yek. Li wir, êdî ne eşkere ye bê kîjan li ko ye û ji ko hata bi ko ye. Li wir, aso pahn e û fireh e; xwe wek perdeke tul ji ezmên, bi ser deştê de berdaye. Li ber bayê tenik pêl lê dikevin û dilîze. Pir spehî ye. Ên ko heta niha ew dîmen nedîne, bêguman ji dîtina spehîbûnekê bêzîn mane. Nav û dengê deşta Mêrdînê li çar aliyên welêt hatiye bihîstin, ji gelek klaman û çîrokan tê zanîn bê çawa ye û bi çi rengî ye. Bi gelek awan hatiye pesinandin û nasandin. Lê dîtina bi çavan, tiştekî din e.

»Hey lo dilo hey lo dilo hey lo dilo,
ji ser ve sax o ji bin ve kul o«

Dengbêjekî navdar di klama xwe de »beriyeke dûz e, pozê qerejdaxa şewitî bi ser de xûz e« dibêje.

Lê yekî din gotiye, »hunermendê hêja, tu rast dibêjî, lê ne hew wilo tenê ye. Heger hew wilo tenê be, tirsa min ji wê tirsê ye ko wê klam kêm be. Bajarê Mêrdînê jî heye. Deşt li jêr e, ew li jor e; xwe li berojê kelehê pêçaye; kelehê, di nav bajêr re serê xwe hildaye, »bilind e, raserî hemû de-
veran e«. Navê wê, Keleha Mêrdînê ye, ew ne xûz e, ew bi awayekî din e; ew wek memika delala min e... ew wek yeke dema ko şazdehên me li ser çûnê bûn û êdî serê huvdehên me xuya dikir e... wî çaxê ko di bin kirasê hevrêşim de xweş serî hildabûn û mêrkuj bûn, wî çaxê ko bi nazdarî ji min re gotibû »na ezîzê min, tika dikim niha bi wan nelîze«, wî çaxê ko sal nû zîvirîbû huvdehan, êdî bi carekê re ew ji ber çavên min wenda kiribûn... Keleha Mêrdînê ne xûz e; ew li qeraxa deştê, di sênga rêza çiyan de, di bin ezmanê şîn re, wek yekê ji wan e, wilo nuwaze bilind dibe; ba-

jarê Mêrdînê, xwe wek destekî bi hesret lê pêçaye û maye. Heta dema ko xortanî gewr jî bû, çi gava min didît, wilo dihat ber çavên min û dihat bîra min ko destên min, bi wî maqamê xwelêpêçana Mêrdînê, hîna bi

hesreta wan in. Lê ev îro deh sal in ko çavên min wê xweşiyê nabînin û ez nizanim bê wê kengî bikaribin bibînin jî«.
»Hey lo dilo hey lo dilo hey lo dilo,
ji ser ve sax o ji bin ve kul o«
Ax! çiqasî xweş gotiye! Bawer bin wilo ye. Gotineke tenê ne kêm û ne jî zêde ye. Û ma kî ne xwediye serpêhatiyeke wilo ye! Rastiya di nava xwe de gotiye.
Dibêjin ko hunermendiya klaman û gotinên xweş, hunermendiyeke kevnar e. Lê heger gotin xweş bên gotin, heger gotin rastiyê bibêjin û heger gotin bikaribin wek rastiya xwestina di dil de, dil bişewitînin, bikaribin rivînên agirê hesretê ji çar aliyan ve bi bedenê bixin, pêlên bêrîkirinê di dilan de rabikin û hêsiran ji çavan bibarînin, ya jî heger wek tama jînê û ava kaniyan, hênik, zelal, nerm û xweş bin, heger bikaribin dilan geş bikin û bikenînin, çi bin bila bibin, hunermendiyeke delal û nû-jen ava dikin.
Wilo ye, bê guman wilo ye... divê klam xweş bên gotin. Gotinên hunermendan nikarin wek dema nokên hişk birijin sêlê bin. Divê ji rastiyê bên û rastiyê li rastê raxin. Divê xweş bên gotin û bihîstin. Klam wilo hatiye gotin. Camêr rastiya di nava xwe de, bi huner-mendiyeke azad, bi hesreteke mezin gotiye.
»Hey lo dilo hey lo dilo hey lo dilo,
ji ser ve sax o ji bin ve kul o«
Deşta Mêrdînê, ji berê de warekî bi nav û deng e, buharan bi bêhn e û bi

reng e. Rê di wir re diçûn Bexdayê û Hindê, di wir re vedigeriyan Amedê û Stenbolê. Gelek navdaran, leşkerên seferê û kerwanên bazirganiyê rêya xwe pê xistine. Hinan lê danîne û mane, hin jî hatine û tê re buhurîne. Warekî bi xêr û ber e û nêzîkî hemû deveran e.
Dibêjin ko rêya dehhezar çekdarên Yûnaniyan jî, dema ji Atînayê meşiyane ser Şahê Îranê, bi wir ketiye. Dema ko bi tûjbûna devê şûran û hêza leşkerên giran ol û îman dihat belavkirin, gelek hezret bi xwe jî heta wir hatine, lê jê û pê ve rê nedîtine.
Dibejin ko Zembîlfiroş jî hatiye û konê xwe li wir daniye... li wir li ber çavên Xatûnê ketiye û dilê wê bi tîra kevanê evînê birîndar kiriye.
15
SORÊ GULÊ

Wê deştê çi diye û çi nediye. Li rojavayê wê, xuşka wê, deşta Heranê heye. Li aliyê din, li hêla rojhilat, gir û newalên Cizîra Botan, walatê Mem û Zînê û Mîran, bi şermokî dest pê dikin û serê xwe hildidin.
Li hêla aliyê bakur jî, rêzeke çiyan heye; hin jê serberjêr dibin heta wir û li wir êdî wek çemekî ko li deryake ji qumê rast bê û biçike, wenda dibin û hin jê jî wek dîwarekî ko dixwazin hênikaya zozanan û belekên berfê ji xezeb û germa Sahra Ereban biparêzin, li dirêjayî, ji seriyekî heta seriyê din, nuwaze bejin didin û diçin. Hin jê, wek suwariyên şerên çaxên kevnar ko li erdeke rast êrîş biribin ser kozikên dijmin û li ber kozikan tev hespên xwe likumîbin erdê ne û hin jê jî, wek ko bi hemû hêza xwe li hemberî êrîşên dijmin rawestiyane û gavekê tenê jî bi paş ve navêjin xuyane. Ya jî wek ko serê hespên xwe berdane, dixwazin li dijmin bifitilin, ji seriyekî heta seriyê din, bi dû hevdu de rêz bûne û kişiyane. Hin jê bilind û dijwar in, qet rê nadin; hin jê jî, li deverinan dilovaniyê dikin, wek dema ko li restauranteke Çîniyan, şagirtekî dilovan xwe ji mêvanan

re ditewîne û bi destê xwe, rê ji wan re diyar dike, xwe nizm dikin û rê didin.
Deşta Mêrdînê, buharan şîn e, bi rengên pûteyiya hunermendî ye, spehî ye. Lê havînan jî wilqasî rût e û bi germa xwe dijwar e. Hew dora bajarê Nisêbînê tenê şîn e û avî ye. Wekî din, li çar aliyan agirê sor dibare. Rewrewk, wek gava di devê tenûreke himhimî re ji nav êgir derkevin, bi saw ji erdê radibin. Dikarin mêran ji desthilanîn de bixin.
Lê heger mirov hunermend be, wênevan be û ya jî heger mirov sibehan zû şiyar be, ne xewar be, buharan, sibehên piştî şevên ko baran bariyabe, ya jî xwêsî ketibe, çaxê ko roj nû hiltê û heta bêriyan, çaxê hîna mij û moran li ser xemla wê be, nerîna wê, ji Mêrdînê pir xweş e. Hemû bi carekê re wilo ji jor ve xuyaye, wilo kûr e û bê binî ye... wek ko mirov ji balafirê lê binere ye. Heta çav dibînin, zadên şîn in û jîn e. Mij û moran û ava li ser zadan, di bin rojê re dibe wek ko deştê tevî kirasekî zîv li xwe kiriye, diçirisîne. Dema wilo di kirasê xwe re xuya dike, rengên kesk siviktir û teniktir dibin... deşt dibe wek ko kirasekî bûkan li xwe bike... bûkeke bi bejin û bal, di kirasê xwe de li ser nivînan... Her ko mirov li dûrtir binere, mij û moran tîrtir û tarîtir dibe, ji cîhekî pê ve, êdî hew mij û moran tenê xuyaye. Wî çaxî, deşt okyanûsek e. Okyanûseke pak ko di bin ezmanekî pak de bi rojê diçirisîne. Çav ji nerîna tiştekî wilo têr nabin, dil ji hiseke wilo sar nabin. Heger ko mirov tu caran derya nedîtibin, dîtineke wê ji bajarê Mêrdînê, dikeve bedêlê.

16 SORÊ GULÊ

Her salê dawiya nîsanê û serê gulanê, çaxê ko nîsk, nok, ce û genim bi dorê zer dibin, lê ew çaxê ko hîna dor nehatiye geniman, ew dîmen, îcar tabloyeke din e. Tabloyeke pir mezin û bi rengên ko tîrêjên rojê tê de pir in diçirise.

Hîna xweş tê bîra min ko çaxê ez di şazdehan de bûm, ji rojan, rojeke serê gulanê, berî çaxê bêriyan bû, berî ko roj dinyayê bişewitîne bû, min ji Mêrdînê ew deşt dîtibû. Tabloyek bû. Gelekî spehî bû. Min wî çaxî, bi herdu çavan ew jî kopya kiribû û li tenişta kopyayeke serê meha nîsanê, wek Îkona xwe ya sêyem, di mejiyê xwe de hilanîbû. Divê ez bibêjim ko min a xwe ya yekemîn, ne di mejiyê xwe de, lê min di dilê xwe de hilanîbû. Ew, sûretê delala min bû.

Deşta Mêrdînê hew buharan... ew spehîbûna hunermendî, ew rengê kirasê bûkan, hew buharan heye. Her salê ji nû ve dikeve temenê bûkan û ji nû ve wê xemlê û xêzê li xwe dike, ji nû ve dibe bûka salê.

»Hey lo dilo hey lo dilo hey lo dilo,
ji ser ve sax o ji bin ve kul o«

Li hêla rojhilat du bajarên şêrîn hene. Pir nêzîkî hevdu ne. Lê heger rastiya herî rast bê gotin, berê şêrîntir bûn, niha nema pir wilo ne. Wek ko bûkek hîna di salên bûkaniya xwe de pir qelew bibe, hûr û hingilên wê jê daliqin, porê wê biweşe, diranên wê bikevin û kereh bibe, hatiye serê wan. Bê wext mezin bûne û rût bûne.

Yek jê, bi nav û dengê xwe Nisêbîna rengîn e û ê din jî Qamişloka bi bext e, »bajarê evînê« ye. Di klaman de, »Nisêbînê paytext e, Qamîşlokê di rex de ye« tê gotin. Yek li jor e, ê din li jêr e. Herdu jî li deştê ne, jor û jêra wan tune ye, lê li gor jor û jêra dinyê û xeta hesin û têlan wilo ye û wi-
lo tê gotin. Yek serxet e, yek binxet e. Nisêbînê li jor e, serxet e, Qamîşlokê jî li jêr e, binxet e. Wek du taxên bajarekî ne. Êvarên havînan, xelk derdikevin ser xaniyan û li dîlanên hevdu guhdar dikin. Mirov pir bi hêsanî dikare, »herdu bajarek in, taxa jêr û a jor in« bibêje.

Lê dîsa jî her tişt li Qamîşlokê pir eşkeretir in û bi ken û kêfê baştir tên xemilandin. Gelekî germ e, lê dîsa jî xweş e. Ji demsalan, buhar xweş in û

li Qamîşlokê, pir xweştir in. Ji ber ko çaxê şahî û dîlanan dest pê dike. Gava havîna gewr tê, êdî hênikayî peyde nabe, debariya mirov ji ber germê û xwêdanê nabe. Hew êvar tenê hênik in. Êvarên ser xaniyan hênik in. Şevbuhêrk li ser xaniyan digerin, razan li ser xaniyan dibe û

dawet û şahî li derve dibin.
Berê çemekî bajêr hebû. Diyariya Nisêbînê û çiyan bû. Lê niha hew payîzan, zivistanan û serê buharan tenê bi reng û lezeke geş tê re diherike.
Çaxê çandinê û avdanê, ji ser wan tê birîn. Li bakurê Nisêbînê, hîna dema nû ji çiyan azad dibe, perçe perçe dikin, li vî alî û wî alî par dikin û pê avdana pembo dikin.
Ên berê, ên ko ev roj nedîtine, wê qet nikarîbûna bawer bikin ko wilo bûye. Rîhspiyên bajêr »nabe« digotin. »Ev çem, çemekî mezin e, aveke dijwar e, dinya hemû jî bê nikare aveke wilo kovî bigire« digotin. Bêxem bûn. Dilê xwe xweş dikirin û »ev çem ji heyaman ve heye û wê her jî hebe. Na bavo... tu kes nizane bê ji kengî ve ye, ji nav çiyayên bakurê herdu bajaran dertê û diherike. Piştî ko ji çiyan xelas dibe, ji bo ko bê û di nav herdu bajaran re debas bibe, bi lezeke dîn xwe rast li wan digire û diherike. Ew diyariya çiyan e. Ma bajar bê çem dibin? Ma kî dikare bigire? Gelekî bi herdu bajaran dikeve. Ji xwe bajar bi çeman xweş in. Çem jî, heger di nav bajaran re biherikin spehî ne« digotin.
Rastiya vê yekê, ji leza çem kifş dibû. Ma bi çi lezê ji nav çiyan derdiket û dida rê! Ên ko nedîtine nizanin. Ma çiqasî dixwest ko zû bigihije herdu bajaran û wan av bide! Salê çar wextan wek rimmekê di nav herdu bajaran re diherikî, di nêvî re diqelaştin, dikirin du tax û du alî û diçû. Pir

bi Qamîşlokê bi xwe diket.
Qamîşlokê, bi meşê, dor saetekê ji çiyan dûr e. Li du aliyên çem ava bûye. Herdu tax bi du piran bi hevdu ve girêdayî ne. Piraniya kuçên mezin, ji seriyekî heta ko di seriyê din re derdikevin, rast in û fireh in; wek xetên damayê hevdu dibirin. Kuçên taxan jî wilo ne. Ew jî heta ko tên ser kuçên mezin, rast in. Heger mirov li seriyekî kuçekê raweste, mirov heta seriyê din dibîne.
Qamîşlokê, ne wek tu bajaran e. Her demê karê hemû kesan lê heye. Malê heftê û pênc welatan lê tê firotin û perên bist û pênc welatan lê digerin. Ji sedsalan ve navenda ramanvaniyê, hunermendiyê, dewlemendiyê, kirînê û firotinê ye. Gelek karwan û bazirganan li wir danîne û mal li vir firotine. Helbestvan, hunermend û dengbêjan, wir ji xwe re hilbijartine, siyasetvan û xwîniyên dewletan li wir bi cîh bûne, şêwir û civînên giran li wir kirine, serketinên xwe li wir di rûpelên dîrokê de nivîsîne. Ji sedsalan ve navendek e. Ji ber vê yekê, hemû kesan xwestiye ko ê wan be. Ji ber vê yekê, şer û pevçûnên mezin li ser kirine û hîna jî dawî li wan nehatiye.
18 SORÊ GULÊ

Demekê ji deman Fransî jî li wir mane. Rastî çi ye, çawa ye ew tiştekî din e, lê tê gotin ko ev kuçên rast, planên dema wan in; xwestine ko Qamîşlokê bikin Parîsa biçûk; ji ber wê yekê serê xwe pir pê êşandine. Ev yek ne dûrî aqilan e. Çemek jî lê hebû, ew jî Seîna biçûk bû. Bajar bê dar û kuçe û meydan nabin. Bi çeman hîn xweştir in. Ev mercê jînê, li hemû deran ji bo hemû kesan e.
»Hey lo dilo hey lo dilo hey lo dilo
ji ser ve sax o ji bin ve kul o«
2.

Nisêbînê û Qamîşlokê du bajarên ko şirîkên kul û êşên hevdu ne, ên dîlan û geşî û serbilindiya hevdu ne... pir nêzîkî hevdu ne... ji bo min yek in... çemekî wan jî heye... pê pir xweş in... ez qet wan ji bira nakim... warên êş û elema dilê min in, ên min û delala min in... evîna min li wir dest pê kir û li wir...«

———000———

Ew qas tenê nivîsîbû. Xuya ye bi nivîsandina tiştên heyî tenê re gihabû. Heyf. Klamek nîvcî ma. Balkêş bû. Dixwest herdu bajaran, çemê wan, deşta Mêrdînê û tirba evîna xwe bi me bide naskirin. Dixwest mirov bibe wir. Dixwest mirov bibe û tiştên bûyî pêş mirov bike.

Heyf. Lê divê klam nîvcî nemînin. Wek ko gul divê vebin, dar bibişkivin, repin ji nav axê bikişin û dendik zîl bidin, klam jî divê bên gotin.

19

SORÊ GULÊ

20 SORÊ GULÊ

Beşê yekem

Nisêbînê bi qijle ye

xweş e, bi dilê me ye

yadê min nedin tu mêran

delalekî ber dilê min heye.

Êdî dem gihabû bibe payîz. Havîna gewr û germa kamax, wê salê hinekî zûtir çûbû, hewa zûtir hênik û dilovan bûbû. Êdî payîza hênik bêhn û rengên xwe yên tarî û giran didan dinyê. Hêdî hêdî zer û xemgîn dibû, diperitî. Lê hîna ne barana pêşî hatibû, ne jî dar gihabûn pelan biweşînin. Hew gihabûn ko hinekan zer bikin û dinyê hinekî xemgîntir bikin. Lê ji

gelek tiştên din xuya dibû ko bayê nû quliptiye, dinya hênik bûye. Carê bayê payîzê yê bi xiroş, wek ko dixwest xelkê bi hatina payîzê û bi dû re jî bi a çile bihisîne, bi hêrs radibû, xwe li vî alî û li wî alî dixist û dîsa diçû. Carnan jî pir bi bêhntengî û ji nifşkê ve radibû û diçû. Wî çaxî pelên zer ji daran dibûn, li ber diketin û pê re diçûn.
Ji rojan rojeke wilo bû. Wê rojê bayekî wilo, ji nifşkê ve radibû û zû diçû û dîsa ji nifşkê ve radibû û dîsa dihat. Bayekî bêbext bû û bi pêlan dihat, wek şepiyekê li dinyê diket û dîsa jê dipengizî jor. Dû re dîsa dadiket, li cîhekî din diket û dîsa dipengizî. Gava ba ji dinyê dipêngizî û ji jêr ve li daran dixist, hinek ji wan pelên zer jî diperitandin û bi xwe re bilind dikirin. Pelên ko bi ber diketin, bi leza ko bilind dibûn nediketin erdê. Bê, ew li wir dihiştin û diçû. Ew dû re hêdî hêdî bi kêfa lîstikvaniyê di ser hevdu re diquliptin û dadiketin. Ewrên baranê hew carekê duduyan hatibûn, bêhn û lerzeke taybetî dabûn dinyê û derbas bûbûn. Xwedê dizane çûbûn derin din, çûbûn ko xwe şanî hinên din bikin. Bi wî awayî xetera ko dê bi çile re bihata, di bîra wan jî dianîn û xwe dîsa li serê çiyan digirtin. Wir ewletir bû. Ji ber wê yekê, ezmanê herdu bajaran, hî-na jî ji bo rojê bû, bi kenê dilgeşiya serdestiyê, di ser herdu bajaran re her diçirisand.
Hîna roj sibeh bû. Bayekî nerm dihat. Roj gihabû hew du bejinan

bilind bibe, gihabû bide ser jora malan û daran. Hîna siyeke hênik li ser hewş û kuçên bajêr bû. Bajêr, sistî û gêjbûna ji ber xewa şevê, hêdî hêdî ji
ser xwe diavêt; êdî deng û bêhn û lebata jîna rojeke nû ketibû hewê. Bi hukmê xwedê, ji hemû sibehên din hêniktir bû. Hîna negihabû germ

bibe, hîna baş hênik bû. Wê demsalê, hewa ne sar e, lê nema germ e jî. Sibeh bi xwe, baş hênik in, hinan jê sar e jî. Nexweşan, extiyaran, mirovên bê goşt û lawaz sar e. Qîz û xortan, mirovên têr û zinde tenê ne sar e. Ew bi xwîna ciwan germ dibin.
Serdar wilo bû. Ew hîna ciwan û nûhatî bû, xwendekarekî liseya Nisêbînê bû. Wê sibehê bedena wî ya ciwan hemû li rastê bû. Xwîna ciwan di bedena nûhatî de digeriya û goştê teze germ dikir. Hewcedariya wî bi tu kincên zêde tune bû. Bedlekî spehî û qutikekî sipî tenê lê bû. Dema ba radibû, qerewata wî bi ber bê diket û li ba dibû. Dibistan nû vebûbûn. Ji ber wê yekê, xortaniya nûhatî, wek her salê wî çaxî, dîsa xemilandî bû.
Hîna çend rojên pêşî bûn. Li dibistanê, hejmara xwendekaran her rojê pirtir dibû. Ên ko dereng ketibûn û ên ko nû dihatin wê dibistanê, êdî dihatin. Hewş û korîdor tije dibûn. Nas û hevalan, hevdu bi sextî didîtin, di nav pirbûnê de wenda dibûn û diçûn. Serdar û Îskanê Cimo li hewşê, li ber derî rawestiyabûn, diaxivîn. Îskan xortekî nêfî bû.
Siya dibistana sê tebaqe, hewşa pêş hemû girtibû. Hewa li ber siyê baş hênik bû. Ên lawaz xwe qijilandibûn û destên xwe kiribûn bêrîkan xwe û ên zinde jî bi serbilindî sênga xwe bel kiribûn û germa xwîna bedena xwe eşkere dikirin. Xwendekar, li hemû deverên hewşê belav bûbûn û komikên biçûk ava kiribûn. Hin jî di ber hevdu re, ji seriyekî heta seriyê din dimeşiyan.
Hewşeke mezin bû. Rojhilat, rojava û bakurê dibistanê hemû hewş bû. Deriyê mezin li hêla rojava bû. Mala mamostan jî, dor bîst metroyan ji dibistanê bi wir de, li ser sê qatan, li qorziya hewşê ya bakur û rojava bû. Li ser wir, leglegekê dest pê kiribû û leq leq dikir. Yeke din jî ji ser dibistanê dabû ber. Kî dizane, belkî tiştên xweş ji hevdu re digotin. Ya jî, belkî klamên xweş ji hevdu re digotin.

Serdar awira xwe anî nav xwendekarên li dora xwe û nerî. Di ser milê Îskan re dît ko du qîz ji hêla mala mamostan ve tên ber bi wan ve. Hêdî hêdî hatin û ji komika ko lawê mala Nigmezinan û ê mala Mihaciran di nav de bûn bi wir de, rawestiyan. Terqîn ji dilê wî hat û »ev a ko min berî bi çend rojan li bajêr dîtibû ye« ji xwe re got. Li serê sûka malê biyan, ji

nifşkê ve di ber çavên wî re şemitîbû. Ji wî çaxî ve dîtina wê bûbû kuleke giran û ketibû dilê wî. Ji wê rojê ve çavên xwe li hemû deveran lê di-gerandin, lê ew nedidît. Û êdî çar- pênc metroyan jê bi wir de bû.
Berê wê li hêla wî bû. Awirên wan li hevdu rast hatin. Çavên wê yên şîn, wek du stêrikên ko di nav rohniya hîva çardehan de bin, vedimirtin û dîsa pê diketin. Diranên wê, di nav lêvên wê yên sor de, wek libên birincê sipî dikirin. Bi nazdarî dibeşişî. Lê tavilê awira xwe bir ber xwe û Serdar li wir hişt. Xwîna wî keliya û di bedena wî de xurt geriya. Kizîna hezkirinê da dilê wî û xurt avêt.
Hevala wê li xwe fitilî û nerî. Xwest bizanibe bê bi kê re beşişîbû. Dît ko awira Serdar li wir e û dibeşişe. Di xetera destpêka dildariyê derxist. Piştî bîstikekê, xwendekar hilkişiyan dersxanan. Derence, di nava avaniya mezin de difitilîn û hildikişiyan jor. Li her qatekê, du korîdor li hemberî hevdu dirêj dibûn heta dawî. Her serê qatekê, li ber derencan, paceke mezin hebû. Yeke wilo li dawiya herdu korîdoran jî hebû. Ji ber wê yekê, korîdor û derence baş rohnî bûn.
Li hemû qatan, li herdu aliyên korîdoran dersxane hebûn. Her ko xwendekar bi zexelî hildikişiyan qatekê, hinên din diketin dersxanan û hindiktir dibûn. Serdar di dersxana li dawiya korîdora qata duyêm de bû. Gava hildikişiya, tê derdixist ko reng û tama awirên wê di dilê wî de mane, xweşiya beşişandina wê di nav goştê canê wî de maye. Rengên dil-

geşiya dilan wek minminîkan li ber çavên wî diçûn û dihatin. Sûretê wê dihat û di serê wî de çêdibû û diherikî ber çavên wî. Carekê duduyan li dû xwe fitilî, nerî, lê ew spehîbûn, bi can û lebat nedidît. Dîsa bi sûretê wê qaîl dibû. Bi wan ramanan çû dersxanê.
Dersxaneke mezin bû. Çil û yek xwendekar tê de hebûn. Sê rêz benk bûn. Serdar li dawiya hemû kesan, li ber pacê rûdinişt. Di wê diramiya. Lê dît ko ew û hevala xwe jî ketin derî. Hatin û li rêza pêşî a navê rûniştin. »Çiqasî baş e ko ew jî di dersxana me de ye« bi kêfxweşî ji xwe re got. Gava
mamostê nav xwendin, ew bi xwe li navê »Gulê« xwedî derket, hevala wê
jî li Berîvanê. »Gulê... welehî Gulê navekî xweş e« di dilê xwe de got.
Dema ew ders çû û xwendekar derketin derve, Serdar bû yek ji ên ko dawiya hemû kesan derket. Heta xwe li nav ên di rê de xist, Gulê, di ko-rîdorê de, di nav xwendekaran de ji ber çavan wenda bû. Bi xiroşî derket derve, li dora dibistanê fitilî, lê ew li tu deveran nedît.
Xiroşa wî bala Îskan kişand û pirsî bê ma li kê digere. »Ez li yekî diger-im« got û zû tê derbas bû. Îskan bi dû wî de nerî, serê xwe hejand û »ba-

jarî ecêb in, gava ew bi xwe bixwazin bi mirov re hevaltiyê dikin« got û bi aliyê din ve çû.
Dor şeşsed xwendekaran li dibistanê hebûn. Wê bîstikê, piraniya wan li derve bûn. Lê Gulê ne li tu deveran bû. Ew wenda kiribû. Serdar hinekî dereng çû dersa din. Gava ket derî, ew li cîhê wê dît û awirên wan dîsa li hevdu suwar bûn.
Hiseke bêhempa ket dilê wî. Ew bi xwe çû cîhê xwe, lê hiş û bal û

awirên wî man li ser wê. Nediçûn cîhekî din. Porê zer kiribû gulîkek û wek rêsiyekî bi pişt xwe de berdabû. Di bin porê wê de, memika guhê wê û rûyê wê xuya dikirin. Hinek ji hinarka wê û serê korziyên lêvên wê jî, sor û pembe dikirin. Çend carekî li xwe fitilî û li hêla wî nerî. Wî çaxî rûyê wê yê spehî didît. Wek sêveke xelatî bû, aliyek sor bû yek sipî bû. Nîvê dilê wî di nava wî de li ser hiliya.

Çend rojên din bi nerînên wilo ji dûr ve çûn. Di nabêra dersan de, li hemberî hevdu radiwestiyan û xwe ji hevdu re diyar dikirin. Dilan gelek tişt dixwestin, lê şermokiya xortaniya nûhatî qewîn bû û tore jî asê bûn, hîna nikaribûn tê re derbas bibin û bigihijin hevdu. Gav ber bi hevdu de diavêtin, lê li dîwarê asê disekinîn û dûrî hevdu diman. Evîndarî hîna bi awiran bû. Ji dûr ve bû, bi şermokî bû lê eşkere bû. Lê hîna ew hefte bi xwe neçûbû, rojbaşî dan hevdu û silav li hevdu kirin. Bi wî awayî hefte û meh derbas bûn.

Misto di Serdar derxistibû û ji dûr ve lê raçav dibû. Hevaltiya wan nû dest pê kiribû, hîna negihabûn ko bi hevdu re baş kûr bikin. Hîna dor ne-hatibû axavtina li ser evîndariyê û tiştên wilo.

Memo, Îskan, Çetoyê kurxaltiya Serdar û Ûso hevalên hevdu yên dibistanê û rojane bûn. Serdar heta doşekê yek ji wan bû, lê ne ê hemû rojan û hemû tiştan bû. Misto jî carnan pê re diçû tev li wan dibû. Ew nû bû û hevalê Serdar tenê bû.

Heçê Çeto, Ûso û Memo bûn, mirovên hinekî pevçûnkir bûn, lê Serdar û ên din ji pevçûnan hez nedikirin. Serdar xwe ji ber wan kirinên wan, hinekî dûrî wan dikir, lê rebenê Îskan bi wan re ketibû nav û nema karîbû ji nav derkeve.

Lê rewş ji bo Serdar û Misto cuda bû. Wan bi xwe, di ber hevaltiya bi wan re, hêdî hêdî hevaltiyeke qewîn bi hevdu re ava dikirin.

Ji hemûyan Serdar û Îskan di dersxanakê de bûn. Îskan ne hew ji gun-

dan bû, lê bi serê xwe jî hîna nîvgundî bû. Gundîtiya wî dibû sedema ko ew û Serdar nikaribin hevaltiya hemû tiştan bi hevdu re bikin. Li gor wî,

gelek tiştên xortaniyê ya bê rê bûn û ya jî şerm û guneh bûn. Ji ber wê yekê, him heval bûn û him jî ne heval bûn. Hîna meheke dibistanê neçûbû, Serdar û Misto bûn hevalên hevdu ên hemû rojan.
Heta wî çaxî jî Serdar evîndariya xwe jê vedişart. Lê Misto çarçav û guh-miç bû, didît. Tiştên wilo ji kê bihatina veşartin, ji wî nedihatin veşartin. Rojekê, dît bê çawa xwe bi lez li korîdorê li nav xwendekaran dixe û daye dû Gulê. Wî jî da dû wî. Lê li serê korîdora navê, Îskan ew hinekî ragirt û dereng ket. Gava derket, dît ko Gulê, Bêrîvanê û Cemîla li nêzîkî mala mamostan, di bin roja geş de li hevdu sekinîne û bi dilgeşî bi hevdu re diaxivin, Serdar jî nêzîkî derî milê xwe daye dîwêr û li wan dinere. Dilê wî hinekî pê şewitî.
Roja piştî barana pêşî bû. Rojeke nazdar derketibû, baş bilind bûbû û dinya germ kiribû. Bêhna xweşî û bextiyariya ko bi baranê re ketibû nav axê, wek hilmeke xweş bilind dibû. Hewa bêdeng û bêlebat bû. Darên di hewşa dibistanê de, piraniya pelên xwe weşandibûn. Tiştên ko mabûn jî, êdî zer bûbûn. Li ezmên hew çend perçe ewrên biçûk û sipî hebûn. Her yekî li aliyekî ezmên, wek lodeke pembo bû. Refek quling bilind difiriyan û ber bi başûr ve diçûn. Hîna baş zû bû, lê xuya bû serme zû hatibû warê ko jê dihatin. Lê leglega li ser mala mamostan, nû ji nêçîrê hatibû û di hêlîna xwe de bêxiroş veketibû. Ew hîna neketibû lebak û xiroşa çûna we-latên germ. Ew hîna ji hewê razî bû. Lê tu tiştan ji van bala wî nedikişand. Ew bi nerîna li Gulê mijûl bû. Misto hêdîka çû pişt wî û bi serê tiliyan ew hêdîka diqdiqand. Piçekî li xwe fitilî.
»Tu yî Misto, te ez tirsandim malava. Ma tu çima wilo bêdeng û bi dizî

tê gidî?«
Misto »ya ya gidî... min tu girt« got û bi awayekî şikdar keniya. Hinekî li hêla Gulê nerî, dîsa li wî nerî, keniya û »xwe wilo li xeşîmiyê daneyne. Tu dikî ji min veşêrî, lê ez dizanim« got.
»Ez dikim çi ji te veşêrim, tu qala çi dikî?«
»Ma di zikê te de ez nabînim ko tu ketiye dû Gulê. Ma tu çima ji min vedişêrî« bêşik got.
Wê bîstikê, dengê qijakeke di xeterê de ji jor hat. Guh diqelaştin. Serê xwe hildan û nerîn. Yek ji ber yeke din direviya. Xwe dida vî alî û wî alî û dixwest xwe jê xelas bike. Wek reveke ji bo xelaskirina canê şêrîn bû. Geh digihayê û qîjînî pê dixist û geh jî serê baskên wan li hev diketin û çend metroyan ji hevdu dûr diketin. Bi wî awayî hinekî bilind bûn û dîsa daketin, dû re çiv dan xwe û li dibistanê fitilîn. Serdar û Misto wek ko

bibêjin »hûn çi ji hevdu dixwazin« serê xwe hejandin.
Lê dîsa herdu tenê man. Serdar dît ko awira Misto hîna li ser e û pevçûna qijakan ew ji bersiva ko dixwaze azad nekiriye. Dibeşişî û li çavên wî dinerî. Piştî ko keserek kişand, bi awayekî nîvtawanbar beşişî û serê xwe hinekî berda ber xwe, nav ramanan. Lê tu hêsanî li wir jî nedît. Her xwe deyindarê bersivekê dît. »Hinekî xebera te ye, rast e«.
»Hinekî? Ew çawa dibe?«.
»Ji ber ko em hevdu baş nas nakin û min hîna tu tiştek jê re negotiye.«
»Lê tu jê hez dikî?«
»Dilê min tê heye, bi min spehî ye û bêqusûr e. Dema ez wê dibînim, ji hêlekê ve tevzînok digirin bedena min û ji hêla din ve jî xweşiyeke nedîtî dikeviyê. Ji ber wê yekê, ez her dixwazim wê bibînim.«

Misto kenekî xemsar pê kir. »Ev e ezbenî... dildarî ev e... birîneke xerab di dilê te de vekiriye. Derman jî, bawer be hew ew bi xwe ye. Ma tu li bendî çi yî? Here pê re biaxive û jê re bibêje ko tu jê hez dikî.«
»Ez zanim ko divê ez wilo bikim. Ez bawer im ew jî li bendî min û vê yekê ye. Ez tê derdixim ko dilê wê jî di min heye. Ez zanim ev tiştê ko ez niha dikim, ne tu aqil e. Lê dîsa jî ez ceger nakim ko herim jê re bibêjim. Dema ez diramim ko divê ez herim hezkirina ko ketiye dilê min pê bidim zanîn, babetekî şermkirinê dikeve nava min, lerzeke kamax digire bede-na min û min di cîhê min de radigire. Ji bo ko ez bikaribim herim û bibêjim, taqet di kabokên min de namîne.«
»Tew! Na hevalo, divê tu bikaribî zora wê şermê û wê lerzê bibî û cegerê xwe bînî xwe û herî jê re bibêjî. Heger bi rastî tu jê hez dikî, divê tu wilo bikî. Şermok, bi şermokiya xwe nagihin tu deran û nabin xwediyên sêng û berên tu kezî zeran. Vê gotina min bike guhar û têxe guhê xwe«.
»Bawer be ez ê ji niha û ne dereng herim jê re bibêjim. Ne hewce ye tu barê min wilo giran bikî«.
»De ez te bibînim« Misto got û kenê xwe yê liblibî û bilind bi ser de kir. Gotin wilo girê dan. Êdî Serdar li fersendekê digeriya û Misto jî ma li bendî wî ko here û jê re bibêje.
Roj dihatin û diçûn. Misto her rojê »ma ka te çawa kir« digot û dianî bîra wî. Bûbû çavdêrê wî karî. Te digot qey bajêr ew hilbijartiye û daye ser serê wî. Lê her carê »min hîna fersendeke baş nediye« Serdar digot û serê xwe berdida ber xwe.
Bîst û heft roj bi wî awayî çûn. Misto, bîst û heft rojan jê pirsî û ew ji ber sistiya wî fedîkar derxist û xemgîn kir. Roja bîst û heştan, tavilê

fersenda ko lê digeriya, dît.

Çar rojan li ser hev baran bariyabû. Xelk di hunduran de aciz bûbûn. Wê rojê, êdî rojeke xweş derketibû, di firehiya ezmanê şîn de diçirisand. Tişt û dinya li bendî rojeke wilo bûn, pê geş bûbûn. Di çaxê bêriyan buhurtibû, dinya baş germ kiribû. Serdar û Misto xwe li pişt dibistanê germ dikirin û qala komando û girtina gundiyan dikirin. Kurikî hemû girtibûn.

Hewşa bi dar li pêşberî wan bû. Hîna ne gihabûn ko baş mezin bibin. Û êdî di nav xemgîniya hatina dijwariya çile de bûn. Piraniya pelên xwe weşandibûn. Çend pelên şîn bi serê şaxan tenê ve mabûn. Çûk, wek ko rojên buharan dikin, derketibûn derve. Qijak, cot cot difiriyan bi vî alî û wî alî de. Refên kevokan, li ser bajêr lîstikeke li gor xwe li dar xistibûn û li dora hevdu difitilîn. Li rasta hewşa dibistanê, du kevokên bi tenê, di ber hev re bilind difiriyan, xwe di ser hev re diqulipandin, dilîstin û dans dikirin. Hemû tişt wê rojê, dildarên rojê bûn, li derve bûn û xwe jê re vedikirin. Mirovên ko kar dikirin, ji sermê û şiliyê, çûk ji qulan û birçîbûnê û xwendekar jî ji hundûran xelas bûbûn. Li hewşê bûn, digeriyan û tahm ji rojê dikirin. Cot cot, sê sê, çar çar li ser çementoya dora dibistanê, xwe ji heriyê diparastin û dimeşiyan. Serdar li herdu kevokên lîstikvan dinerî û qala xalanên xwe yên girtî dikir. Ji nifşkê ve Gulê û Bêrivanê di ber wan re derketin û çend gavan ji wan dûr rawestiyan. Misto ew zû dîtin, gotina wî birî û »ha waye, de niha, ji niha baştir tune ye« got. Gava çavên wî lê ketin û Misto jî bi ser de wilo got, êdî çavên wî nema tu kes didîtin. Hew ew tenê li wir hebû. Xwe nema di cîhê xwe de digirt. Şerma ko ji Misto dikir lê giran bû, lê cegerê wî xurt bû. Tiştê ko ew dikişand ba wê, hêzeke xurt bû. Tavilê bêşik meşiya û çû ba. Li bendî ko Misto tiştin din jî bibêje, nema. Dema gavên xwe di bin giraniya şerm û xiroşiyê de bi biryardarî bi aliyê wan de diavêtin û diçû, herduyan berê xwe dabûn aliyê wî û wek du xezalên ko li pilingekî binerin, bêlebat

bûbûn û lê dinerîn. Bi esehî zanîbûn ko rê girtiye ba wan û wilo bi esehî zanîbûn bê mebesta hatina wî çi ye. Nîvê lerz û kamaxa dinyê ya mayî, bi ser bedena Gulê de hilweşiyabû. Ne deng û ne jî can di bedena wê de mabû. Lê ew dema wek her çend saniyên piştî zelzelê, dirêj neajot. Serdar »roj baş... Gulê ez dixwazim bi te re biaxivim« got û li hêla Misto nerî. Çûbû. Lerzeke sivik girt bedena wî û xwîna wî germtir bû. Gava dîsa li wan nerî, Gulê hîna li wir bêdeng û bêcan bû. Girtin û berdana nefesê, di bedena wê de rawestiyabû. Bêrivanê, »baş e, ez ê herim hundur, ez tî me«

got û ji wir çû. Êdî lerz û xiroşa ko ketibû bedena wê, di tenêbûnê de pir-tir û girantir bû û her ko diçû hîna girantir dibû. Heta dema Serdar devê xwe vekir, gihabû bibe wek risês giran.

Serdar, »tiştê ko ez dixwazim ji te re bibêjim...« got û destê xwe avêt piş-ta stûyê xwe, awira xwe daxist ber xwe û wilo ma. Wî çaxî dît ko sola wî ji herdu teniştan ve, li ser du santîman bi herî ye, bi heriya reş e, a kuçên taxa xizanan e... Çavên wî wilo didîtin, lê hişê wî tiştekî wilo nedidît. Ew bi karê peydekirina gotinên ko dê bikaribin li mebesta wî bên, mijûl bû. Gulê di nav xiroşa kamax de li bende bû. Texmîn dikir bê wê çi jê re bibêje. Ji ber wê yekê, dilê wê xurttir lê dixist û ew dihejand. Lewra heta ko hatibûn wê rojê, gelek tişt bi çavan ji hevdu re gotibûn. Lê tiştê ko texmîn dikir wê jê re bê gotin, di jîna wê de cara yekem dibû. Ji ber wê yekê, di nav xiroşê de tenê û bêdeng mabû. Dikir ko xwe li ber lêdana dilê xwe bigire, bikaribe piçek nefes bistîne û berde. Lê ne hêsan bû. Dixwest ew dema sext zû here û hinek hêsanî bibîne. Lê wext rawestiyabû, dema axavtina wî nedihat.

Tavilê »ez çawa bibêjim... Gulê, belkî te jî tê derxistibe ko roja min nû tu dîtî, dilê min bijiya te û ew dilbijandina min roj bi roj xurttir bû, bû dilketin. Ez îro dixwazim ji te re bibêjim ko dilê min di te heye, ez dixwazim bizanibim bê ka tu çi dibejî«got û awira xwe hilda ser rûyê wê û lê nerî. Tiştê ko didît, spehîbûneke bêhempa bû. Lê wek dema ko berf di ber bayekî tenik re dibare û serê çiyan bi lez digire, kêf û xiroşî tev li hevdu bûn û bi lez ser dilê wî girtin. Lê dilê li bendî bersiva wê, ne wek çiyayekî giran bêlebat bû. Xurt lê dixist. Wek meşka bi sêpêyan ve li vî alî û li wî alî diket, sênga wî pê re hildida û dadiket. Bahozeke mezin di dilê wî de rabû. Pêlên evîndariyê, kêfê û xiroşiyê bi dînî di dilê wî de rabûn, di ser hevdu re quliptin, hevdu hilweşandin, bûn reniyeke mezin û bi ser deşta kezeba wî de daketin. Ava ko xwe berdida ser kabokên wî geh sar dikirin û geh jî germ.
Gulê jî, hîna di halê xwe yê berê de bû. Xiroşa dilketina xortaniya nûhatî, ew hejandibû. Li çîmên xwe dinerî. Di dilê wê de ko çîmên wê kin dibin. Di dilê wê de ko hestiyên di çîman de dihelin û goştê nerm bi ser hevdu de kin dibe. Rengê saweke xedar li rûyê wê da der. Gava dît ko çîmên wê kin nebûne, xwest ko bikaribe hinek qewet di bedena xwe de peyda bike û bi wê qewetê hêsaniyeke aram di bedena xwe de ava bike. Carekê duduyan xwêsiya xwe daqurtand û serê xwe hilda. Rojê da rûyê wê, diçirisand. Çavên wê hinekî qijilîn û diranên wê di nav lêvên wê re

diçirisîn. Lêvên wê zuwa bûbûn. Tavilê bi sextiyeke mezin »ez jî ji te hez dikim« got. Xîz xîza xiroşê ji qirika wê dihat.
Gotin hatin gotin. Êdî giraniya kamax ew berdan û qewet di wan de geriya. Rehên herdu bedenan hevdu berdan û hêsanî di wan de rûnişt. Gulê ji ber wê yekê spasî jînê kir. Wê bi xwe xweş di wê yekê derxist.

Rengên sor û pempe dîsa li lêvên wê vegeriyan.
Peyman wilo girê dan û çûn hundur.
Serdar çû rewş ji Misto re got. Misto ew pîroz kir.
Xweşiyeke nû û nedîtî ketibû dilê wî, hîna nikarîbû bêkêmasî tercume bike, lê ji Misto re şirove dikir.
Gava çû malê, rast çû û xwe avêt stûyê Gulçînê û hinarkên wê maçî kirin û »spas ji bo te ez anîm dinyê, dayê« got.
Gulçînê kincên zarokan dişuştin, destên wê di nav kincande bûn. Ew himbêz nekir, lê ew ji dil maçî kir û »çi bûye kurê min... dêya te bi dor serê te bigere... tu îro wilo bi kêf î... xêr e« got.
»Dinya û jîn gelekî xweş in, ji ber vê yekê ez bi kêf im dayê« got û di ber xwe de tewirand û hêdîka dest bi gotina klamekê kir û çû pirtûkên xwe danîn hundur.
Gulçînê bi dû de lê nerî û ji xwe re got »xwedê xêr bike, ev çi kêf e«.
Lê zû vegeriya û »xwarin, yadê... ka xwarinê, ez ê îro ji gurekî bêtir bixwim« got.
»Kurê min weleh îro hewaleke te heye, xêr e?«
»Min ji te re got yadê... jîn xweş e, ji ber wê yekê...«
»Wey dêya te bimire û êşa te nebîne, wey tu sed salan wilo dilgeş bijî. Berxê min, hima çixarake din bêhna xwe li min fireh bike, ez ê karê xwe zû xelas bikim, dû re ez ê xwarinê ji te re amade bikim« got.
»Baş e yadê« got û dest bi fîkandinê kir û dîsa çû hundur. Gulçînê bi dilgeşî bi dû wî de nerî û serê xwe hejand. Ji rengê rûyê wê xuya dibû ko êdî bi lawê xwe serbilind e. Tê derdixist ko lawê wê mezin bûye, êdî xort e. »Gelo bi dil e« ji xwe re got. Tavilê dengê radioyê ji hundur hat. Klameke zîz digot.
————-o————
Peymana di nav wî û Gulê de, serê rê û wêneyê jîneke nû bû û ew bi xwe

jî xwazgîniyê wê bûn. Bi hêsanî û xortanî bû, hindik û sade bû, germ û zû bû, lê ji dil bû. Dû re roj hatin û çûn, gihan hevdu baştir nas bikin.

29

SORÊ GULÊ

Şermokiya xortaniyê hêdî hêdî ji ser xwe avêtin, bi hevdu re pirtir axivîn û ji hevdu re gotin. Êdî bûn şirîkên jîna hevdu a rojane û hemû tişt bûn mijara axavtinên wan. Piştî demekê jî, soza ko piştî dibistanê hevdu bikin dan hevdu.

Lê wê roja pêşî, çaxê Gulê çûbû malê, kenekî bêdawî girtibû ser dev û lêvên wê. Heta wî çaxî êdî lerzê û xiroşê ew berdabû, hêsaniyeke dilgeş di

bedena wê de ava bûbû.

Gava Sêvê ew wilo dilgeş dîtibû, texmîn kiribû bê çi bûye. Berê jê re qala wî kiribû: »tu nizanî bê çi xortê spehî ye... û gelekî li min dinere... dema li min dinere, tevzînok wek gêrikan bi bedena min ve hildikişin...« gotibû.

Bi bihîstina wê re, Sêvê tê derxistibû ko bayê dilê xortaniyê di dilê xuşka wê de rabûye. Wî çaxî ev yek bi taybetî nekiribû mijara axavtinê, lê ji çendakî pê ve, ne ko ev yek di lebata wê de jî nedidît. Ji ber wê yekê, gava ew wilo bi kêfeke cuda, a lebata xortaniyê dîtibû, ecêbmayî nemabû; »hebe tune be, ew e, tiştin ji hevdu re gotine« di dilê xwe de gotibû. Lê Gulê xwe pir negirtibû, ew biribû qorziyekê û jê re ta bi derziyê vekiribû.

***

Sêvê, bi Xalitê Kevanan re destgirtî bû. Ew jî li dibistana Gulê bû. Sala dawî dixwend. Li ber dilê wê pir ezîz bû. Gava gotin diçû ser wî, ava çeman disekinî. Ne neheq bû.

Xalit wek gurekî zozanan bû, çarçav û guhmiç bû. Li her derê bû û bi

hemû tiştan dihisiya. Hemû kesan ew bi komunîstiya wî nas dikirin. Li gor ko dihat gotin, du sindoq kovar û pirtûkên wî li malê hebûn. Serê çend rojan carekê karin ji xwe re li deverinan derdixistin û diçû çend rojan ji ber çavan wenda dibû. Gava dihat jî babet babet kovar û pirtûk bi xwe re dianîn. Pêşî wî bi xwe dixwendin û bi dû re jî dihat ji xwendevanan re bahsa naveroka wan dikir, bêtirs propaganda komunîzmê û Kurdperweriyê dikir. Bi merdî didan dost û nasan. Ji ber wê yekê, êdî gelek hevalên wî di nav xortan de çêbûbûn. Ji xwe meyla guhartina ramanên gelekan ber bi Kurdperweriyeke çep de bû.
Lê Xalit bi van kirinên xwe, dijmin jî ji xwe re çêkiribûn. Yek ji wan, Ûsivê bûrayê wî bû. Xalit li ber çavên wî wek marekî reş bû.
Ûsiv par dibistan qedandibû, lê Xalit wî çaxî jî ew darê xwe dajot û naskirî bû. Hîna wî çaxî »bi esehî« zanîbû ko »komunîst e û Urusî ye.«
30 SORÊ GULÊ

Heger ko jê bihata, li darê dinyê ew nêzîkî mala xwe nedikir. Sêvê bida gawiran jî nedida wî. Lê bi a wî nebûbû. Dema dor hatibû xwestina Sêvê, xwe cirnexweş kiribû, lê Hecî Elî, »na kurê min, eksê neke... ez û bavê wî hevdu baş nas dikin, malbateke baş e, bavê wî camêrekî baş e. Tiştê ko Xalit aniha dike, xortanî ye, wê bê guhertin« gotibû û wek xwe kiribû. Serdar jî Xalit ji dûr ve nas dikir û nîvdostên hevdu bûn. Ew jî xwediyê ramanên wek ên wî bû. Lê pirtûkên wî hindik bûn û hîna jê ciwantir bû, negihabû ko bi qasî wî fêrî tiştan bibe. Heçê Xalit bû, şareze bû, li pêşiya hemû kesan bû.
Roja ko Gulê çûbû malê û çîroka hezkirina xwe û Serdar ji Sêvê re gotibû, ew bîstika hatina wî hemû ta bi derziyê vekiribû. Çawa ew dîtibû, çawa ji wir ve hatibû û çawa jê re gotibû »dilê min di te heye«, hemû jê re

gotibû. Heta bi wê lerza ko ketibû çîmên wê jê re gotibû. Bi dû re jî bahsa wî kiribû. Bahsa temenê wî, dirêjbûna wî, rengê çermê wî, rengê porê wî, awayê rabûn û rûniştina wî, şiklê ken û axavtina wî û her tiştên wî yên din hemû jê re gotibû.
Sêvê tê derxistibû ko Gulê dildar bûye. Tiştên wilo zanîbûn. Salek çûbû ko destgirtîbû. Xwe di derheqa evîndariyê de baş fêr û amade kiribû. Ji Xalit fêr bûbû.
Xalit ew fêrî gelek tiştan kiribû. Ji roja ko Sêvê bûbû destgirtiya wî û pê ve, guhertinên eceb tê de bûbûn. Bi gotinên xwe biaqiltir, girantir û dilovantir û di kirinên xwe de jî biryardartir bûbû.
Sêvê bi dilovanî lê guhdarî kiribû. Gulê, bal û hişê xwe hemû berdabû ser bê wê çawa bikaribe Serdar bêkêmasî pê bide naskirin. Gul li rûyê wê ketibûn, hinarkên wê sor bûbûn. Şînbûna çavên wê, mîna perdeke tenik li ber pacake nîvvekirî, dilîst û diçirisand. Zimanê wê di derheqa tiştên nû de vebûbû û bêrawest bûbû. Êdî xuya dibû ko peyvên wê, ji wî cîhê ko xweşiya xiroşa evîndariyê jê dertê û dide bedenê, tên. Wê bi xwe jî di wê yekê derdixist. Dilê wê bi lez lêdixist û xwîna wê bi lez di bedena wê de digeriya. Tevzînokên henekçî, wek gêrikên suwarî bi bedena wê ve hildikişiyan. Xurtbûna gera xwînê, germbûneke xweş dida bedena wê; bêhneke xweş ji gul û çîçekên ko di berojê dilê wê de vebûbûn difûriya û di derneyên çermê canê wê re dida der. Ew bêhna ko zilaman mest û har dike bû. Bêhneke mê bû, taybet bû. Pîrekên gihayî tenê dikarin bêhneke wilo ji canê xwe bidin der. Êdî ew jî pîrekeke gihayî bû.
Tiştekî bêhempa hatibû serê wê. Cara yekem tiştekî wilo dihat serê wê. Kêf û xweşiyeke nedîtî û nû ketibû dilê wê û bi xwînê re di nav goştê be-

dena wê de digeriya. Wê xweşiyê, xwestinên wê bêhedan dikirin, wek hespên kovî radikirin ser du nigên dawî û li ser dilê wê misogerî pîkolê dikirin. Tiştekî ko berê qet nikarîbû texmîn bikira, hatibû serê wê û ew dihejand. Babetekî hezkirinê bû; lê ne wek a ji bo hinên din bû. Bedena wê hemû tije xweşî û bextiyarî bûbû.

Bayekî nerm li dilê wê dixist. Geh germ dibû, geh jî hênik dibû. Têlên dilê wê pê re dilerizîn û ji hevdu dixwarin. Tiştê ko hatibû serê wê, ne wek tu tiştên din bû. Ji nava xwe, ji devereke kûr bi xwestinên xwe yên pîrekî dihisiya. Ji wê rojê pê ve, êdî xwe rojekê tenê jî ji wan xwestinan azad nekiribû. Ji ber wilo bû Serdar gelek caran dihat bîra wê û dilê wê bi hezkirinê dihat givaştin. Dema dihat bîra wê, dilê wê siviktir lêdixist, xwîna wê xurttir di bedena wê de digeriya.

Di xeyal û ramanan de, pê re tenê mabû. Gava ji nifşkê ve dîtibû ko Sêvê li hemberî wê ye, hinekî soromoro bûbû, lê Sêvê alîkarî pê kiribû û »ma çi di vê de heye xuşkê! Ne şerm e û ne guneh e... adeta dinyayê wilo ye« gotibû û kiribû ko xweşiya di bedena wê de peyda bûbû, cîhê xwe xweştir bike û bimîne.

Mabû, û ew dîl girtibû. Her xwestibû ko di wê derheqê de biaxive, û axivîbû. Bi rojan axivîbû. Bêhedan bûbû. Axavtin hêsantir bûbû.

Sêvê di derheqa wî de ketibû mereqeke mezin.

Tavilê êvara piştî wê roja pêşî bi heşt rojan, êdî xwe nema girt û »welehî tu dê sibe wî şanî min bikî, ez dixwazim bi çavên serê xwe bibînim bê ka yekî çawa ye« got.

Gulê pêşî bawer nekir, lê dû re dît ko rast dibêje. Entresa Sêvê, hezkirina wê qewîntir kir. Bi nazdarî got »welehî Sêvê ez newêrim wî şanî te bikim. Tu mezin î û tu xweşik î, tirsa min ji wê tirsê ye ko tu wî bibînî û ji min bistînî«.

Sêvê di ber kenekî dilovan re got »Xalit li ber dilê min ji hemû kesan

spehîtir e, min ê xwe divê û ê te jî ji te re«.
Wê êvarê, hevdu bi wî babetê axavtinê kirin xewê.
Gulê xewneke ne wek ên her carê dît. Didît ko di mêrgeke xewle û xamoş de, tik û tenê ye. Dansa dilgeşiyê dikir. Balerînayek bû. Çîm û çepil vedikirin, bilind dikirin, li hev digerandin û li dora xwe difitilî. Lê, na! Ne li pêyan bû û dans nedikir. Raketî bû. Pirtûkeke evînê dixwend. Her der şîn û geş bûn. Rêzên daran li pişt wê bûn. Bêhna dar û gulên têv-el, hewa giran û hênik kiribû. Rojê ji jor ve li bedena wê dixist û ew hêdî hêdî disincirand. Ji dengê daran û çûkan pê ve, pêjina tu tiştan li wan te-

peşan nedihat. Ew bi tenê dilgeşa wê mêrgê bû. Taceke gulan li serê wê bû. Ne wê bi xwe ji xwe re çêkiribû. Lê ma gelo îcar ew ji ko hatibû, kê ew jê re çêkiribû. Tavilê didît ko ne tenê ye, didît Serdar jî li ba wê ye. Pirtûka xwe datanî û êdî xwe radida. Serdar jî wilo dikir. Di derheqa pêşerojeke geş de diaxivîn. Pêşerojeke bi hev re ava û rave dikirin. Axavtin
hêdî hêdî germ û xweş dikirin. Lê tavilê dît ko Serdar xwe daye ser enîş-ka xwe û destê xwe avêtiye qumçên ber sênga wê û yek bi yek ji xwe re vedike. Pê re hilm û bêhna nêr da bêvila wê û çû nav xwîna wê. Hêla wê ya mê zû peyde kir û xwe lê pêça. Xwîna wê bû lehî û di bedena wê de rabû. Xwe li ber nedigirt. Dilê wê bi kurpîn diavêt û digevizî. Hedanî di tu deverên bedena wê de nedima. Wek deryakê ko pêl lê rabin, aliyekî be-
dena wê radibû û aliyê din dadiket û bi ser hevdu de dihat givaştin. Êdî çavên xwe digirtin û serê xwe bi herdu aliyan de dibir û dianî. Jana ko ketibû bedenê, bi wî awayî ji xwe re hêsantir dikir. Lê qet nedibû. Dilê wê dikir ko ji sênga wê derkeve û bifire. Sêngê ew bernedida; dizewirî, hildi-

da û dadiket. Tê derdixist ko dev û bêvila wê, nema têra girtin û berdana nefesa wê dikin, nema kezeba wê hênik dikin. Serme, xiroşî û azwerî wek bayekî sar, wek dema ji nav berf û bahoza zozanên bilind tê û li mirov dixe, ji hêla nigan ve, di rehên laşê wê re, di nav goşt û canê wê de bi bedena wê ve hildikişiya heta ser sênga wê û li wir, li ê ko ji hêla serî ve dihat, diqelibî. Li wir, wek dema ko birq diteqe û li dinyê dixe û dihejîne, bi jan û êş xwe berdidan nava wê û lerzeke dîn didanê. Îcar germeke kamax diket bedena wê. Wî çaxî germê, wek bayê Sahra Ereban li rûyê wê dixist. Bayê ko di nav goştê canê wê de rabûbû, hêdî hêdî bilindtir û xurtir dibû. Rehên bedena wê radikişiyan û li bedenê kin dihatin. Dikirin ko biqetin û bedena wê bikin piç û parî. Dikirin ko goştê canê bedenê tevî ji xwe biweşînin. Ne karê aqilan bû. Ji serî heta neynûkan dilerizî, diperpitî. Destê xwe yê rastê li Serdar gerand, ew girt, lapûşkên xwe di pişta wî
çikandin û ew bi ser xwe de kişand. Şaş bûbû, ji destê xwe derketibû, bi esehî nizanîbû bê êdî wê çi bibe, ya jî ew ê bi xwe îcar çi bike. Ji ber wê yekê, dixwest tiştê ko wê biba, êdî zû bibe û derbas bibe. Wê bîstikê, xwestina bi çavan dîtina sedem û kaniya wê xweşiya ko dida can û bedena wê, di dilê wê de bêhedan bû û rabû. Gava çavên wê li ên wî ketin, dît ko awirên wî wek du rojan li kêleka hevdu ne û germê û jîna nêr berdidin bedena wê û dişewitînin. Gava Serdar qumçên ber wê vekirin û destê xwe
hêdî hêdî li ser taximê sêng û berên wê gerand, êdî nema karibû nefesa xwe bigire û berde. Bedena wê wek ewran di ser hev re diqulipt û li erdê

diket, êdî perpitandina mirinê dikir. Perpidandina mirineke xweş bû.

Stû li ber rada. Herdu çav li dinyê girtin û çû. Êdî lerzeke germ, bi êş, bi jan, dîn û har ketibû bedena wê. Tiştekî nedîtî û bê hempa bû. Ji ber wê êş û lerzê, destê xwe yê din avêt ser destê wî û bi ser memika xwe ya rastê
de eciqand û axîneke wek axîneke ji ber êşeke xedar kişand. Tavilê têna germa lêvên wî jî da ên wê û bahozeke hovtir di bedena wê de rabû û ew bi jan û lerzeke dîntir hejand. Bilind bû û li erdê ket. Wî çaxî ji xewê çeng bû û şiyar bû. Tiştê ko êdî didît, reşaya odê bû û ew jî di nav nivînên xwe de bû. Tu mêrg li dora wê tunebûn. Ne Serdar hebû û ne dengê daran di-hat û ne jî ê çûkan. Bi tirs û poşmanî, bi nalîn »hîna nû destên wî gihabûn min, çima wilo zû qediya« ji xwe re got.
Sêvê bi dengê axîna wê nîvşiyar bûbû û jê pirsî bê ma çi bû.
Gulê got, »min xewnek dît, tiştek nebûye«.
Sêvê, »sibe ji min re bibêj« got û dîsa ket xewa xwe û ew tenê hişt.
Lê Gulê nema karîbû raza. Ji xwe re »ax, xwedêyo... hîna nû destên wî gihabûn min... ma çima wilo zû çû, çiqasî xweş bû... ax, ma ew çi lerz bû di bedena min de peyde bûbû!.. dest û nigên min dikirin ko ji bedena min biweşin... êşek bû... lê êşeke xweş bû... ma gelo bi rastî wilo ye... ma gelo gava ji wilo zêdetir dibe, êdî ew çawa ye... ax xwedêyo, dibêjin sikra-ta mirinê heye... gelo ew sikrata mirinê bû... gelo gava pîrek û zilam wî tiştî dikin çawa ye... wextê destê zilaman bigihijin mirov wilo be, gelo ew tişt bi xwe çawa ye.... bi kêmasî sed qatan heye... na, ez ê xwe li ber tiştekî wilo negirim...« ji xwe re got û hêdî hêdî, incex piştî saetekê dîsa ket xewê.
Sibehê, xewna xwe ji Sêvê re got. Lê wek ko dîtibû jê re negot. Ew xweşiya ko dibû perpitandin, jê veşart. Li xwe dananî jê re bibêje. Li darezaniya wê pirsî.
Sêvê got, »evîndarî wilo ye... lawikê mirov bi şevê di himbêza mirov de

ye... ya di xeyalan de û ya jî di xewnan de li ba mirov e«.
Lê ev ne bersiva hemû pirsên ko di dilê wê de bûn, bû. Heta dor deh rojan, ji xwe re »xwedêyo, ma ew çi bû... hîna nû destên wî gihabûn min... gelo gava zilam û pîrek wî tiştî dikin çawa ye« gelek caran ji xwe re digot û li bersivekê digeriya. Lê Sêvê jî nikarîbû bersiva pirsên wilo bide. Wê bi xwe jî hîna bi esehî nizanîbû.
Gulê, wê sibehê ji bo xatirê Sêvê, neçû dibistanê. Hîna êvarê li hevdu kiribûn ko wê nîro herin û wê Serdar şanî wê bike.
Wilo kirin. Xwe xemilandin û çûn.
Rojek ji rojên payîzê bû. Dar xemgîn û westiyayî bûn. Yek liban pelên

şîn bi serê şaxan ve mabûn. Pelên zer bi ber bê diketin û bi xemgînî di-weşiyan. Roj baş ji dinyê dûr ketibû. Êdî payîz bû. Dinya, rengzer û tarî bû, wek çavê kul bû, xemgîn, sist û westiyayî bû. Germa havînê çûbû, bayê nû quliptibû, hênikayiya payîzê hatibû. Hew dor nîro tenê hewa germ û xweş bû. Demê, baş nêzîkayî li sermê kiribû. Neh roj bi ser barana pêşî ketibûn. Lê piştî wê, êdî tu carên din baran nebariyabû. Hîna jî pi-raniya rojan, ezman sayî bû û ji rojê re bû. Carnan ewr perçe perçe di-hatin ezmanê raserî herdu bajaran, xwe hinekî dizewirandin, tirş û tal dikirin, lê tu tiştek nedikirin. Bi ber bê diketin û diçûn, dîsa cîh didan tîrêjên rojê.
Wext ber nîro bû. Sêvê û Gulê, saeta belavbûna dibistanê, li aliyê din ê kuçê, li rasta deriyê mezin rawestiyan. Piştî ne bi gelekî Serdar û Misto hatin. Bi xiroşî »ha waye hat« got û ew şanî Sêvê kir. Kenê dilgeşiyeke bêhempa girtibû ser dev û lêvên wê. Dikeniya û difûriya.
Kirasekî sorê tarî lê bû. Gulên biçûk lê hebûn. Lê ji çend gavan pê ve, êdî ew gulên biçûk nema xuya dibûn, yekser sor dibû. Bi wî kirasê sor, ji

dûr ve, wek çîçekeke hinaran bû. Kuçe tije mirov bû, lê ew bi xwe, bi wî kirasî di nav hemû kesan de xuya dibû.
Misto, herdu xuşk zû dîtin. Enîşka xwe li tengala Serdar xist û destê xwe ber bi wan vekir. »Ha waye Gula te, li pêşberî te ye« got.
Serdar veciniqî û nerî. Dîtina wê, dilgeşî tenê di bîr û bala wî de hişt û hemû tiştên din avêtin. Ne tirs, ne guman û ne jî xem man.
»Lê ew a pê re kî ye Serdar can« Misto got.
»Sêvê ye, xuşka wê ya mezin e.«
Serdar, hew carekê tenê ew ji dûr ve dîtibû. Pir dixwest ko wê rû di rû de nas bike. Gulê, jê re pir qala wê û başiya wê kiribû. Lê wê bîstikê, bala wî ne li ser wê bi xwe bû.
Misto gotin domand: »lê te qet ji min re qala wê nekiribû«.
Serdar ne pir miştiriyê axavtinê bû. Wê bîstikê hew xwestineke wî tenê hebû. Dîtina Gulê bû. Xwestineke ji sibehê ve bû. Misto bi xwe jî di wê xwestina wî derxistibû. Dîtibû ko sist û xemgîn e. Asoxî, di navbira dawî de, xwe mecbûrê ko »Serdar can, ne berxik e û li çiyan nemaye, gur wê naxwin, wê sibe bê« bibêje, dîtibû. Lê xem û bêrîkirin her di dilê wî de mabûn. Û êdî li hemberî wî bû. Misto ev yek ji bîra kiribû.
Çûn û li ber herdu xuşkan rawestiyan. Bi dilovanî rojbaşî dan wan.
Gulê, ew bi Sêvê û Sêvê jî bi wan da naskirin. Piştî lêpirsîna serê xeber-danan, gava êdî Serdar »Gulê tu îro ne hatibû dibistanê... min pir li rêya

te nerî, lê tu nehat... hêvî dikim tu ne nexweşî« got, xwest hemû hezkirina xwe bi axavtina xwe û beşişandina dilgeşiya xwe re, jê re eşkere bike.
Gulê got »na welehî, ez ne nexweş im... lê karên min û Sêvê hebû... wê serê havînê bizewice... em ê herin bajêr û hinek kincan jê re bikirin... ez

îro ji ber wilo nehatim dibistanê«.
Çirûskên kenê bextiyariya dilan ji çavên wê diçûn, dan nava wî. Kizînî ji dilê wî hat. Lê xebera nêzîkbûna birina Sêvê, hêleke dilê wî xemgîn kir. Ramaneke xaîn ket hişê wî: »piştî wê, êdî dora Gulê tê û ez ne amade me... wê hin din...«
Îskan, Ûso û Çeto wê bîstikê di ber wan re derbas bûn û berê bala wî bi silavê guhertin. Bi mane beşişîn û derbas bûn. Dor deh gavekî bi dû wan de, Perîxanê û Cemîla dihatin. Bi giramgirî dibeşişîn. Silav dan wan û derbas bûn. Sêvê ew nas nedikirin, lê gava Gulê ew dîtin, serbilind bû. Ew bi lawikê wê re didîtin.
Serdar dilgeşiya wê dît. Xwe ji nav xemên xaîn kişand, xwe da ser hev-du û beşişî. »Gulê min tu caran tu bi vî kirasî nedîtibû, çiqasî bi te dikeve« got û awira xwe ji jor ve hêdî hêdî daxist bi jêr ve û dû re jî ji jêr ve bir bi jor ve. Awira xwe li ser kirasê wê û li bedena wê tevî gerand û dîsa li çavên wê nerî. Rûyê sor dît. Dît ko êdî rengê xwîna pîrekî di rûyê wê re baştir xuya ye. Tê ramiya û dît ko êdî pîrekeke bêqusûr e. Bi awireke xurt dîsa li bedena wê nerî. Îcar baştir dît. Ziravbûna zaroktiyê ew baş berdabû, serê herdu memikên wê, xwe di bin kirasê hevrêşim de çar tiliyan bi pêş de hildabûn, goştê mê, xwe bi rahn û kulîmekên wê ve hûnabû û ew tekûz kiribû. Ji nû ve û êdî bi çavên zilaman spehîbûna wê hemû didît, tiştekî nedîtî bû. Xwe nedigirt, dest û lêv û hemû deverên xwe di awira xwe re dişandin ser bedena wê û xwe lê dipêça. Hezkirin di awirên wî de, bi xwestin û kirinên erotîkî hatibû barkirin û bi ser bedena wê de di-herikî. Hemû deverên wî, dibirin û li ser bedena wê, yek bi yek, bi cîh dikirin. Wê rewşa wî ya bêhedan baş ajot û ew hejand. Lê dibêjin ko dil bi dilan dizanin, dil di bêdengiyeke kûr de jî ji hevdu fam dikin. Awirên wî, mesaja wî rast gihandibû Gulê. Hinarkên wê sor û germ bûbûn, çavên wê xav û lêvên wê zuwa bûbûn. Dilê wê li ber awirên wî, dansa

bixêrhatinê ji xwestinên wî re dikir. Bêdeng û bêlebat bûbû, li çavên wî dinerî. Tiştekî ko ew didahfand himbêza wî, di nav goştê bedena wê de, xurt û germ dibû. Tiştekî nas bû, tahma wî tiştê ko di xewna xwe de dîtibû, jê dihat. Ne ew tiştê kamax bi xwe bû, lê tahm, ew tahm bi xwe bû. Cara di xewnê de, xweşiyê di nav goştê bedenê de dest pê kiribû. Lê

îcar ji dil bû û bi dû re diherikî nav goşt û li bedenê belav dibû. Herdu nigên xwe didan erdê û bi sextî xwe li hember radigirt. Lê îşkence bû. Halê herduyan yek hal bû. Halekî xerab bû. Du dil, di leza girtina reko-reke nû de bûn. Ber bi hevdu de dibeziyan. Pir nêzîkî hevdu bûn, lê nedigihan hevdu. Êdî rewş gihabû xeterê.
Serdar di rewşê derdixist. Didît ko awirên wê xavtir û kovîtir bûne. Wek du şîşên sor dilê wî dax didan û dadiketin ser kezeba wî. Du birînên kûrtir vedikirin û diçûn. Lê didît ko wê kovîtiyê kiriye ko xiroşa di bede-na wê de serdestî wê bibe. Êdî ken ji bîra dikir û xwe şaş dikir. Misto tê dernedixist, lê Sêvê didît bê çi tê serê wê.
Serdar tavilê li xwe xurcilî, lixavên xwestinan girtin destê xwe û mebesta awirên wê rawestand, bahoza ko dikir ji bo hilweşînê rabe, belav kir.
»Gulê ma tu dê sibê bê dibistanê?« got û xwest bal û mijarê biguhere.
»Erê, ez ê bêm«.
Lerzeke nerm ketibû deng û lêvên wan. Axavtin di derheqa hatin û ne-hatina dibistanê de bi çend gotinên din jî domandin, lê ji hemû tiştan bêtir, ew bi xwe ji bo hevdu balkêş bûn. Bi awiran, tiştên negotî ji hevdu re digotin.
Dilê Gulê di sênga wê de bilind dibû û dadiket. Tirsek ket dilê wê. Hat bîra wê: »divê ez nehêlim ko hin wî ji min bistînin« ji xwe re got. Dixwest ko baskên wê hebûna, firek bida xwe û çend fitlan di ser bajêr re bifiriya,

xwe wek kevokên buharê bi dilgeşî li hewayê biqulipanda, qîr bidana û bajar hemû pê bihisanda ko bi dildariya wî pir bextiyar e. Dixwest ko bi serbilindî bibêje »gelî mirovan... ka li min guhdar bikin... Serdar lawikê min e, çavên xwe bernedinê, ew ê min e«. Dixwest ko ji çavan û her ba-bet xetera ji ber wê bi xwe birinê, dûr be, ji wê tenê re be. Lê nizanîbû ko ew bi xwe jî di tirseke wilo de ye, xwe ji bîra dikir ko divê xelk çavên xwe bernedin wê jî; ji bîra dikir ko êdî ew jî a wî bi xwe ye. Û xetera mezin li ser serê wê bû. Gelekî spehî bû; ji ber wê yekê, diviyabû herdu bajaran bizanîna ko ew jî ne bêxwedî ye.
Serdar bi şeş mehekî jê mezintir bû. Rîh û simbêlên wî nû derketibûn. Lê wê sibê kur kiribûn, bêtir bûbû tiştekî li gor çav û dil û diranên qîzikan. Xwîna germ, reng dabû çermê teze, diçirisand. Dor metro û heftê û pêncan dirêj hebû. Zirav û lihevhatî bû. Şuştî û pak bû. Gewr û por reş bû. Bi bejina xwe, bi pakbûna xwe, bi dilovaniya xwe, bi axavtina xwe, ew li hemberî Sêvê serbilind û dilşa kiribû. Êdî ev yek jî hat bîra wê. Li xwe fitilî û bi awiran pirsî. Geh li wî dinerî, geh jî li Sêvê. Çirûskên bex-

tiyariya dilê wê wek derbikên sersalê ji çavên wê diçûn û reng û rohnî di-dan çar aliyên wê.
Wey li vê tofanê! Ma îcar ka Misto li ko maye, bi ko de çûye?
Ew her sê bi hevdu daketibûn û ew li wir ji bîra kiribûn. Lê ew jî di cîhê xwe de bi Sêvê daketibû. Wek gava ko pilingekî birçî li xezaleke li cîhekî hinekî dûrî xwe binere, du awir tê çikandibûn û hiştibûn. Du awirên çi dilbijîna kamax bûn!
Sêvê hemû tiştên dema zaroktiyê bi dû xwe de hiştibûn û kemilîbû. Mezinbûn û spehîbûna xwe piçik piçik ava kiribû û êdî temam kiribû. Û

tu tiştên xwe yên mê û pîrekî li ba dinyê nehiştibûn. Êdî xwediya bedeneke gihiştî bû. Bejin avêtibû, kulîmek gurover û sêng fireh bûbûn, lêv û hinark sor bûbûn û memik çar tiliyan di bin kirês de kişiyabûn. Li gor xwestina dilê mêran bi reng û xwê bûbû, diçirisand û difûriya. Hîna tu qiriktahlî û jana jînê nekişandibû, destên zalimiya zilaman û ê feleka xopan lê neketibûn û dilê wê bi xem û bêzariyan tarî nebûbû. Bi qasî mûyekî tenê jî hîna jê neheliyabû. Bedena wê tije pîrekî bû. Hemû tişt nû û nûjen di cîhê xwe de bûn. Hemû tişt bi pûteyî anîbûn û êdî ji Xalit re hilanîbûn. Hemû tişt di bin kirasekî de hilanîbûn û di hukmê destên Misto de bûn. Bedewbûna wê hemû di wî kirasê tenik re xuya dibû. Misto bi merdî lê dinerî. Bejineke dirêj û bi şax û per bû. Pêşî li çavên reş belek, li lêvên tenik dinerî. Ji wan dest pê dikir û di ser gewriya wê re, xwe hêdî hêdî berdida ser sêngê û taximê memikan. Wir ji ber dikir û di ser navikê û newqa zirav re xwe berdida ser kêlekên bi goşt û tiştên din. Li ser
diheliya, hişê wî ji serê wî diçû û li ber wê dima. Ji nerîna wê qet têr nedibû. Sêvê ew li ser xwe avêtibû nav xeyalên xweşiya jînê û li wir hiştibû. Ew qet nediket bîra wê. Bila ew tenê bibêje ez wek qîz hatim dinyê, min bejin û bal avêt û xortan lê nerîn. Misto sûretê wê di hêwana serê xwe de
çêdikir. Ji serî heta nigan bû. Rengîn û bi can bû. Tiştê ko derxistibû, tabloyeke wek a Goya bû, Maya Tazî bû. A Goya raketiye, lê a wî li pêyan bû, wilo baştir xuya dibû. Hemû didît. Lê kesereke kamax kişand û rastî hat bîra wî.
Xalitê Kevanan spehîbûna wê zûtir dîtibû. Ji ber wê yekê dil li ser avêtibû û çûbû berî hemû kesan hilik dabû. Dilketin wilo ye. Divê here serî. Ew carekê tenê li bajêr dîtibû û nema ji bîra kiribû. Hildana salixdanên wê û esil û pesnê wê û bavê wê ji xwe re kiribû kar û emelê şev û

rojan. Ew peyde kiribû, xeber jê re şandibû, soz jê stendibû û bi dû re jî çûbû xwestibû û nîvê milkên bavê xwe tê de dabûn. Wê êdî bibûya a wî.
38 SORÊ GULÊ

»Xwendinê û nivîsandinê nizane, lê qet xem nake, ez ê wê fêrî hemû tiştan bikim« gotibû. Lê wê rojê dîsa bi derinan de wenda bûbû, ne li dibistanê bû. Qirdê Misto bû, lê dîsa jî Sêvê pir dereng dîtibû. Êdî Misto, ji bo wê, ne yekî balkêş bû. Bêyî ko bi awireke pîrekî tenê jî lê binere, tavilê dor
hatibû çûna ji ba wan.
Sêvê, Serdar û Misto ji ba xwe û Gulê bi rê kirin û ew bi xwe hinekî din jî li wir rawestiyan. Xwestin ko ew bi dûr bikevin û bi dû re bidin rê. Sêvê xuşka mezin bû, wê bîstikê berpirsyarî di stûyê wê de bû û biryar jî di destê wê de bû. Xwest ko wilo bibe û wilo bû. Zanîbû ko nedibû bidin kêleka xortên xelkê û di seranserê kuça mezin re bimeşin heta bajêr. Gihabûn armanca xwe, ew dîtibûn. Piştî ko dor sed metroyekî ji wan dûr ketin, Sêvê ji nû ve bi nazdarî got, »heger ez ne destgirtî bûma, min ê
ji te bistenda. Gulê rebenê... ma çi qasî şêrîn e«.
Kêfa wê hat. Pêlên xweşiyên jînê di dilê wê de rabûn û daketin. Ew dikilan. Bêrîkirin, wek lehiyeke dîn hat û li dilê wê qelibî. Gulê dixwest xweşiyên jînê hemûyan bi kenê xwe, bi ser dinyê de bireşîne, wê bixemilîne û xweştir bike. Û dû re jî dor bê jînê. Li aliyekî wê, ew û Serdar bijîn, li aliyê din jî Sêvê û Xalit û hemû kesên din.
Ew roj, di jîna wê de rojeke taybet bû. Cara yekem xwestinên wê rû di rû de, ji bo zilamekî, di bedena wê de wilo dîn û har dibûn û tahm û mana jînê diguhertin. Cara yekem xwîna wê bi wan xwestinên wê re, wi-

lo xurt li bedena wê digeriya, germeke hênik dida bedena wê, hêdî hêdî li
tevî vedida, lê difitilî, xwe lê dipêça û ew dişewitand. Di dilê wê de pêlên xwestina tahma jîneke nû, a wê jîna ko bi serê xwe tenê nîvê jînê hemûyî ye, radibûn û ew dihejandin. Kiribûn ko dilê wê û bedena wê, bi xwest-ineke bêhedan bi xweşiya wê bihisin. Kêfeke cuda ketibû dilê wê. Kiribû ko lerzeke biyan di bedena wê de peyde bibe û lê vede. Lerzeke nerm û xweş bû, lê dîsa jî kamax bû. Goştê canê wê dikir ko ji hestiyan biweşe. Cara yekem, wê rojê, wê bîstikê bi xwe şermokiya xortaniyê di dilê wê de ew berdabû. Ew di warê dil de, ji sedî sed azad kiribû û ji ber wê yekê ji dil xwestibû ko bi Serdar re tenê li cîhekî bûya, xwe biavêta stûyê wî, xwe lê bigeranda û ew maçî bikira û bêhn bikira û bigivaşta; û germa goştê bedena wî jî, bêyî ko di tu kincan re bihata parzinandin, bida goştê bedena wê. Cara yekem wê rojê dilê wê wek ê pîrekan bijiyabû nêrbûna wî. Wek çemekî bihêz û bêdawî bû. Radibû, dihat û ew li ber xwe dibir. Ew dibir û diajot himbêza wî. Êdî nema hevalekî wê yê dibistanê bû. Ew roj, roja dinya dilê wê bû. Her babet ramanên zarokatiyê ew bi carekê re
39
SORÊ GULÊ

berdabûn; êdî Serdar zilamek bû û ew bi xwe jî pîrekek bû.
***
Serdar û Misto pişta xwe dan herdu xuşkan û hêdî hêdî ji wan bi dûr ketin. Sistî û bêzarî hêdî hêdî di bedena Serdar de dîsa girantir bû û êdî babetekî êşê ji ber dida dilê wî. Êşa tirsê û xemgîniyê bû. Zewaca Sêvê ew tirsandibû. Serê xwe kişandibû nav milê xwe, tê diramiya û di ber Misto re dimeşiya. Bêdeng bû. Bi ramanên bêxîret re daketibû nav kul û xemên kûr. Li tenişta Misto, wek korekî ko bi yekî din re bimeşe bû. Rê û tişt ne-

didîtin. Misto xeber dida, li qîzên spehî û kuçê tevî çarçav dibû, hemû tişt didîtin, lê hîna di rewşa Serdar dernexistibû. Li qîza midîrê banqê û her-du hevalên wê dinerî, li pêşiya wî û Serdar bûn. Bala wî pirtirîn li ser dûvê a midîr bû. Carê, »ma ne tu dibînî Serdar can bê bêbavê çawa dihejîne û mirov dihilîne« digot. Gava gihan rasta êş pêşî, bêhna mîz û serkulên ker-an ket bêvila wî û du caran pişkiya. Gava nerî, dît ko du kerên şamî li ber deriyê êş girêdayî ne. Devê xwe bi bêaqilî diavêtin binê cuherê xwe yê vala
û teriya xwe bi bêhntengî li vî alî û wî aliyê xwe dixistin. Dengê kar û berx û elokan ji malên derdorê dihat. Berxê mala bekçiyê îstasyonê filitîbû, dûvê xwe bi qapanî li ba dikir û li wan rastan digeriya. Serê Serdar di ber de bû, tu tiştekî ji wan bala wî nedikişand.
Kuçe dagirtî bû. Wan çaxên rojan, çûn û hatin dîsa pir bû. Pêşî cem-seyeke leşkeran û bi dû re jî taksiyek di ber wan re xurt derbas bûn. Toz û tirabêlk bi ser kuçê xistin. Bû kuxt kuxta hemû kesan û çavên xwe firkandin. Misto bi xwe çend xeberên bêpîvan bi dû wan de dan, lê ma xeber dikarin çi rast bikin. Kuçe wek gevzeka keran bû û trafîk jî karê hirçan bû. Çavên wî û qirika wî jî tijê toz bûbûn.
Her salê ev hawe bû. Dîsa ew qûma sor a qelp ji devê bestan anîbûn û li kuçê vala kiribûn. Ew jî awayekî çêkirina kuçan bû. Lê ne çêkirin tu çêkirin bû û ne jî qûm tu qûm bû. Nîviyê bêtir axa sor bû û bi ser kuçê dakiribûn. Reyisê belediyê û şirîkên xwe, ji bo ko bikarîbûna xuyakirin bidana ko karinan dikin û her wilo jî hinek peran xerckirî xuyakirin bidin, salê carekê wilo dikirin. Salinan jê, du caran wilo dikirin. Ev yek, li gor hatin û hebûna peran bû. Heger pere hebûna, diviyabû li bajêr xer-ckirî xuyakirin bidin.
Carê eniya xwe ji xwêdanê zuwa dikirin û bi quretî karê xwe pêş xelkê dikirin. Xwedêgiravî ji bo ko kuçe nebin herî wilo dikirin. Lê xerabtir

dikirin. Gava şil bû, dibû herî û gava zuwa bû jî, dibû toz û bi hewê diket. Her salê ev yek dianîn serê xelkê.
Gava Serdar û Misto gihan rasta daîra avê û avdanê, êdî bêhna çaman dihat. Hinek ji ên derdorê diqusandin û hinek jê jî ji binî ve dibirîn. Bêhneke tûj dabûn derdorê. Carê serê buharan ew kar dikirin, lê wê salê çima payîzê wilo dikirin, ne kifş bû. Misto diaxivî, lê hişê Serdar ne li wî bû, li cîhekî din bû, ew bi nav xeman de kûr daketibû. Piştî ko qîza midîrê banqê û hevalên xwe li tirimpêla Fûadê Sebriyê Medê suwar bûn û çûn, Misto ji Fûad bêhnteng bû, xwest giliyê wî li ber Serdar bike, êdî qîz ji bîra kirin û hişê wî çû ser wî. Tê derxist ko bêkêf e û lê guhdarî nake. Hat bîra wî ko peyvên ko lê vedigerandin hew »im..., na..., belê..., çawa na...« bûn. Wî wextî axavtineke wilo di nav wan de derbas bû:
»Çi hewala te ye, tu çima wilo bêdeng î Serdar can?«
»Ez hinekî westiyayî me, û ez hinekî jî... ez xeman dixwum.«
»Xem!.. xemên çi gidî? Kerwanên te li ko hatine tazîkirin?«
»Heçê tu yî, tu her tiştan sivik digirî. Lê xema min ji bo Gulê ye... ez xe-ma wê dixwum, Misto.«
»Ê... çi bi Gulê hatiye... tu çima xeman ji bo wê dixwî?«
»Gulê gelekî spehî ye ne wilo?... ez bi xwe wilo bawer im?«
»Rast e, spehî ye. Lê ma çi bi spehîbûna wê hatiye. Ma ne baştir e?«
»Ji min re baştir e. Lê pir spehî ye û perên xelkê ji gûyê kûçik pirtir in. Dikarin bên çewalên peran li ser cila bavê wê vala bikin û jê bistînin. Ya jî belayên din bên serê wê. Êdî gihaye... va ye wê Sêvê jî here... êdî dor a wê ye... xelk bela xwe ji ên gihayî venakin.«
»Ohoo! Tu jî bi dû çi ketiye! Dahşik bê terî çêbûye, heger mezin bibe wê çawa mêşan ji ser xwe bifirîne! Mesela te wilo ye. Xem û mitalên te jî

ecêb in ha. De ka van tiştan ji hişê xwe biavêje û xwe hinekî bişidîne. Ji hemû kesan bêtir ji te hez dike. Ez ne bawer im ko tu kesên din bike. Malava, yeke wek Gulê delala kê be, wê bi hemû deverên xwe bikene û her demê şa be« got û hinekî bêdeng rawestiya. Him tiştin din ji bo gotinê dianîn bîra xwe û him jî mecala dora gotinê dayê. Lê pir zû, dîsa wî bi xwe dest pêkir: »Ew xuşka wê Serdar can, ew jî pir spehî ye. Lê te bi xwe ew nedidît, te li Gulê dinerî û wan herduyan jî li te dinerîn. Gava we hersêyan li hevdu dinerî, tu kesan ji we ez nedidîtim. Min jî li wê dinerî, min ew ji ber dikir. Bawer be ez niha zanim bê çi çawa ye.«
»Sêvê... ew destgirtî ye malava... ew ji te re nabe, li ser birinê ye. Ma ne Gulê qala wilo jî kir. Lê xuya ye, deng nehat te, hişê te ji serê te çûbû.
41
SORÊ GULÊ

Desgirtiyê wê jî hevalekî me ye... na gidî ew ji te re nabe.«
»Ma çawa deng nehat min. Lê destgirtî be, bila destgirtî be. Spehî ye û mirov dikare lê binere. Destgirtîbûn ne astenga nerîna min e. Ez bi xwe wilo me. Ma ez çi bikim ji dilê xwe. Heger ko qîz spehî bin, destgirtî bin ne destgirtî bin, ew dibije wan. Lê dilê min ne bi wî awayê ko tu dibêjî dibije Sêvê. A min, dilbijandin e û dû re jî ji bîrakirin e. Çi gava ez ên wilo dibînim, ez xwe nagirim, dilê min dibije wan. Ez nikarim xwe bigirim. Şermek di vê yekê de tune ye. Ma ne xortanî ye. Dilê min, »ax, Sêvê çi jin e, çi spehî ye, ji min re lê binere« dibêje. Ez xwe li ber emrekî wilo nagirim. Bi xwedê heger tu kirasê xwe jî bi çirînî dilê min dibije Sêvê«. Wilo got, mirûsê xwe hinekî tirş kir û »yanî naseke te ye, tu jî zikê xwe li ser diêşînî, ne? Hih! Dilê min mêşeke hingiv e Serdar can... qîzên spehî jî çîçek in û gul in. Dilê min ji ser yekê difirê, li ser a din datîne... çîçek li ko bin, ew wan dibîne. Ha...ha... ha...!« got.

»Tu eceb î Misto. Hêvî dikim rojekê dengê te naçe destgirtiyê wê. Bawer be berî ko tu bigihijî îfada xwe bidî, wê çermê te kunnikî ji te bike. Xalitê Kevanan destgirtiyê wê ye... ma ne tu wî nas dikî?«
»Ji dûr ve. Silava me heye. Lê ez ê bibêjim min nizanîbû ko a te ye Xalit. Serdar ev rê bi ber min xist, ha ha ha.«
»Hevalo tu dê qet pîr nebî. Xwezî bi te û dilê te. Tu ne xwe aciz dikî û ne jî xema tiştekî dixwî.«
»Ha ha ha... ma ez bêaqil im. Ez rojê nizanim bê ez çendan dibînim... dilê min dibije hemûyan. Berî niha... berî niha bi xwe dibijiya qîza midîrê banqê... ma ne te dît bê dûvê xwe çawa dihejand. Û niha jî ez Perîxanê dibînim. Ma ne tu nizanî bê çi qasî dibije Perîxanê. Ê... de ka vê yekê safî bik... heger ez rabim bi a dilê xwe bikim, ez dildikevim hemûyan û dû re jî ez ê rûnim û xema wan bixwum. Divê ez dû re tu karan ji ber xwarina xem û mitalan nekim. Na gidî! Spehî, spehî ne û ji bo ko dilê mirov bibi-je wan in. Lê bila bêaqilên wek te xeman bixwun...«
»Ma wilo dibe Misto, hima dilê mirov bibije...«
»Tu ka pêşî li min guhdarî bike. Te tiştek ji min pirsîbû... tu bersivekê dixwazî. Ez ê îcar a rast ji te re bibêjim. Çavê mino, jinik ji te hez dike, ji bo te aqilê xwe berdaye, lê tu xema ko wê hin têrpere bên û wê ji bavê wê
bistinin dixwî. Tu bi a min bikî, tu dê van tiştan ji hişê xwe biavêjî û di tiştên xweştir biramî. Gava dor hat wê yekê, qey em jî naçin xwe di dawe-ta wan de nahejînin. Em ê bi destê wê bigirin û birevînin. Bila dû re bên bi gunnê lawê te bigirin. Çû... êdî Gulê a te ye... êdî wilo bizanibe. Heger

mir, ji axê re ye û heger sax ma, ji te re ye.«
»Tu baş dibêjî û xweş dikî, lê...«

»Lê çi? Heger me li kuçê fitiland, ma ji te re. Heger ko te ew kir a xwe û pê ve, wê kî bê wê ji te bistîne. Tu ka bibêje min bê wê kî bê ji te bistîne.«
»Ew wilo ye, lê ez naxwazim wilo...«
»Ha ha ha... lê, divê tu bikî ko tiştê te pê kiriye, heta deh rojan bi çavan jî lê xuya bike ha ha ha...«
»Te dîsa piça perda ser rûyê xwe avêt û te da nav. Malava, ma hima wilo hêsan e. Heger mesele wek ko tu dibêjî hêsan be, ez dikarim sibê wê birevînim û »bikim a xwe«. Lê ez jê hez dikim Misto... ez naxwazim wê wilo nizm bikim. Ez naxwazim wê bi wî awayî bikim a xwe. Ez dixwazim ko di nav xelkê de ser ji ê wê bilindtir tune bin, ez dixwazim ko her tişt normal bibin, ez dixwazim ko her kes rûmetê bidê Gulê. Ax Misto! Xuya ye tu min fam nakî. Ez dixwazim daweteke mezin ji bo wê li dar bixim, şahiyeke mezin bikim. Lê ne niha. -gava wî wilo digot, Misto lê dinerî û hêdî hêdî dibeşişî. Tiştên ko digotin, nediketin serê wî û serê xwe dihejand- Dibistan heye?.. ma ez dibistanê berdim? Û ma tu nabêjî min bê ma em ê xwe bi çi xwedî bikin? Mala me... tu dizanî ko em li malê wek kîroşkan li ser hevdu radizin... ez ê wê bibim, bikim a xwe û bi dû re... em ê di ko kevin?«
»Ooho, tu dibêjî kûr bajo, hûr bajo, lê bila ga ne êşin. Ma wilo dibe lo? Tu ka bise... ew ê çawa dibêjin... im... »bila dil bi dil be, bila doşeka me erd be, lihêfa me ezman be, balîfa me kevir be û tûrê parsê li mil be« dibêjin. Ez ji birayê xwe re bibêjim... heger tu xwediyê wî aqilî bî, gava ser bi serî hat jî tu wilo nakî, tu li darê dinyê nikarî wê di ber xwe xî û pê şa bibî. Ma ne tu jê hez dikî... devereke we ya razanê tune ye... jê xweştir... herin li nav mezel razin... ox... tu kes li wir tune ne... cilekî ji xwe re bibin û herin li wir razin. Dinya û ezman hemû ji we re.... ox...«
»Malava, ne wilo hêsan e... wilo nabe... em hîna kamil nebûne,

hukûmet jî me nade hevdu...«
»Ez ê di hukûmetê... dîsa devê min ji ko vegeriya. Te çi ji hukûmetê ye lo! Xwe pêş hukûmetê nekin. Ma ko we bigirin wê çi ji we bikin? Wê te di hepsê xin. Hepis bila hepis be. Dor salekê maye ko tu bibî hijdeh. Te idam nakin! Heta tu bibî hijdeh, nema te digirin. Wê bavê wê bê li ber gunnê lawê te bigere. Lê wek ko min got... hima me nû bi pişt kuçê xist, divê tu kumekî ji birayên wê re bidrû... bila bi dorê têxin serê xwe... ha ha
43
SORÊ GULÊ

ha... bila tiftik be... ha ha ha...«
»Ez ê ji te re jî yekî bidrûm, tu mereqan nexwe...«
Misto gotina wî birî û »ha ha ha... de were ser îmanê. Bavo bila ji min re be, tu ka bidrû!« got.
Serdar bi dû re »Misto can, heger tu a rastiyê bixwazî, ez jî di dilê xwe de wek ko tu dibêjî dibêjim...«
»Ji ber ko xebera min e, tu jî wek min dibêjî. Wî çaxî, rêyeke din li ber te tune. Heger hewce bû, rê, revandin e û kum e, kum. Dû re ez ê herim şanî birayê wê bikim û bibêjim Serdar ev dirûtiye, ma çawa ye, ma te jî yekî wilo navê?.. ha ha ha... dîtina wî hêsan e... ez ê ber esir herim ber camiyê... bê guman ew li wir e. Hih! di vî temenî de û camî?« got û mirûsê xwe tirş kir.
Heta ko di sûkê tevî re derbas bûn û li serê Kuça Belengazan ji hevdu veqetiyan jî, axavtina wan ev bû. Misto, »em ê birevînin bira, heger rewş hat wir, bawer be em ê birevînin... bila dilê te safî be. Bawer be êdî heger mir, ji axê re ye û heger ko ma jî, ji te re ye« got û xatir jê xwest. Serdar spasî wî kir, beşişî û »ne hela baştirîn e, lê heger pêwîst be, divê em wilo

bikin« got.
Misto, di Kuça Bexçan re serjêr bû. Dû re, piştî kuça Rebenan li destê rastê fitilî û ket Kuça Şîlanan. Mala wan, ji dawiya kuçê ve, a sêyem bû. Di nav kuça wan û a Belengazan de, kuça Rebenan hebû. Li seriyê din ê herdu kuçan, îcar Kuça Dengbêjan ew dîsa di ser kuça Rebenan re bi hev-du ve girêdidan.
Êdî Serdar tenê ma û Kuça Belengazan dom kir. Ji Gulê pê ve tiştekî din di hiş û bîra wî de tunebû. Gulê, tenê di hêwana mejiyê wî de bû. Bi hezar ramanên di derheqa wê û xweşiyên pê re de, serê xwe hêdî hêdî dîsa
berda ber xwe û çû. Dêna xwe dîsa da hal û rewşa xwe û wê. Guhê xwe da dilê xwe. Ji hêlekê ve kizînî jê dihat û ji hêla din ve bayekî hênik lê rabûbû. Tê derdixist ko evîndariya wê ketiye dilê wî û wek derziyeke xilqandî pê ve maye. Tê derdixist ko bayê evîndariyê di dilê wî de rabûye û êdî tu xelasiya wî jê nemaye.
Wî çaxî Lopûhov hat bîra wî. Evîna wî dixwend. Gihabû ko yekê ji her-du pirtûkan bixwîne. »Ma Lopûhov ji bo Vera çi nekiriye?« ji xwe re got û di derheqa xwe û Gulê de giha biryarekê.
»Ez ê bi destê Meyremê -na, na, ê Gulê- bigirim û birevînim
ez ê wê li hemû deveran bi xwe re bigerînim
44 SORÊ GULÊ

di nava çi dawet û dîlana ko heye de
wek demançeke pûlisî ji ber xwe bikişînim
li ber pozê kurên camêran
xwe pê re li erdê xînim
û bihejînim«
Gava ket deriyê hewşê, dît ko xalê wî Evdo, Qasoyê muxtar û Cindiyê

Tûjan li hêwanê li ser doşekan rûniştîne. Bi ken çû ba wan. »Hûn berdan xalo... xwedê topekê li mala wan û dewleta wan bixe... hûn bê sedem girtin û ji karên we hiştin« got. Bi dû re berê xwe da Qaso û Cindî û »heger ko niha bavê min li malê bûya, wê heyfa roja ko hûn ji bo karê xor-
tan ketibûn pêşiya dêya min û xêliyan ji we hilanîya« bi henekî got. Ew keniyan û »wî çaxî adet wilo bû xwarzê« gotin, lê Gulçînê kenekî bi serê lêvan kir û di nav xwe û kekê xwe Evdo de cîh jê re vekir. Zozanê çû di dawa xalê xwe de rûnişt, lê Gulçînê ew ji dawa wî dexist. »Xalê te nexweş e keçkê, were ba min« got. Serdar ji nû ve nigên xalê xwe dîtin. Nû limêj kiribû, hîna li ser sicadê bû. Herdu nigên wî wek du bacanên reş bûn.
»Wax, wax, wax... ev çi kirine ji we xalo?...ev çi hal e... xuya ye segbavan hûn êşandine, hûn ji kuştinê berdane... me jî dilê xwe xweş dikir û me digot tiştek nekirine, wê çend pirsan ji wan bikin û wan berdin...« got.
»Xwarzê welehî bavê me şewitandin... ne bi şevê û ne jî bi rojê etlahî di-
dan me... welehî do dor bêriyan dev ji me berdan... ma ko mirov ket nav lepên wan hewceyî kirina tiştinan heye xwarzê?... ew her li mirov dixin... doza tivingan li me dikirin... gava me digot tivingên me tune ne, doza bê ka kî qaçaxçî ne, kî tiştên bi Kurdî dixwînin, li me dikirin. Ne dînê wan heye û ne jî îmana wan. Gawir in. Baş bû ko ên me yên din wê sibehê çûbûn karwantiyê û xelas bûbûn, pîvaz biribûn nav Omeriyan. Ew nû ji gund derketibûn û komando girt ser me. Xalê te Şêro û Guro wilo xelas bûn û xalê te Reşo jî çûbû ber pez«.
»Erê welehî... ew xelas bûn baş e, lê xalo bi xwedê hûn êşandine... ma ên we jî wilo ne« berê xwe da herdu camêrên din û got.
Qaso gotin girt û got: »xwarzê bi serê te lêxistina ko li me kirin, mirov li keran nake. Min bi xwe bawer nedikir ko em ê sax ji wir derkevin. Ûj-

danê mirovan bi wan re tune ye. Bi serê te her yekî ji me destîbivirek li me
şkandin. Îcar serposk, pihîn û kulmên ko li me xistin qet nayên hesaban. Yanî qaşo ez muxtarê wan im. Ji hemû kesan bêtir li min xistin. Ji xwe Remê Gurî nikarîbû bimeşe. Simê mala Gewrê û birayê wî ketin bin
45
SORÊ GULÊ

çengê wî û ew di nav xwe re birin«.
»Çûn ku?.. ma ka we bi ko ve şandin... bila ew jî bihatina vir« Serdar got.
»Ew jî çûn mala merevên xwe. Min ji wan re got werin em herin mala Gulçînê, lê nehatin. Nexwestin rê li we teng bikin. Lê xem nake xwarzê, em gelek bûn, em hemû di vir hilnedihatin. Gava cîh hebe, mirov li hev-du teng neke baştir e«.
»Xem nedikir xalo...« gava Serdar got, Gulçînê gotin ji devê wî girt û got: »kurê min bi serê te min jî ji xalê te re got, lê xuya ye xwestine herin mala merevên xwe, li mala Faroyê Omerî ne«
»Ka em ê nigên we di nav ava germ û xwê xin û bifirkînin... dibêjin ko xwê û ava germ baş e«.
»Na xwarzê, xem nakê, ez xalê te me... ma min hindik rojên wilo dîne! Wê di çend rojan de rehet bibin... bila canê xwarziyê min ji min re sax be... de ka qala xwe û dibistanê bik. Înşeleh xircir tune. Hûn xwendekar jî ne rehet in...«.
Cindî got »welehî xebera wan e... ma ji bo ko em tê derxin ko tadahiyan li me dikin, divê hîna çi bikin ji me. Em ne bi zimanê wan dizanin û ne jî bi bextê wan. Bi xwedê xebera xwendekaran e... em û ew ji vir heta ba xwedê dûrî hev in. Ma em çiyên hevdu ne. Heta ko ew li welatê me bin,

wê halê me jî ev be. Lê em pîs in, yek ji me bi a yê din nake«.
Qaso, »erê lawo em jî zanin xebera wan e... lê ma ka em ê çawa bikarib-in bi vî leşkerê mezin... xebera wan e, lê ma ka mezinekî ko em hemû bi a wî bikin heye? Ma kîjan axe xwe dide ber barekî wilo giran?«.
»Wê çêbibe« Cindî got.
Evdo gotin girt û got »xwezî bi wê rojê... lê ma ka... xebera muxtêr e... yek ji me bi a yê din nake... bê mezin ev kar nabe... lê ma ka mezinê me... xwedê em hemû pîs kirine û ji guhên xwe avêtine. Ew jî nema serê xwe bi
me diêşîne«.
Serdar, »gelî xalan, ev yek bi mezinekî nabe. Divê em hemû ji hêla xwe ve lê rabin. Em ne pîs in, lê em nezan in. Heger em li hevdu guhdar bikin û hevdu fêrî tiştên baş bikin, wê mezin ji nav me derkevin...«
»Hah, tu çavê min î xwarzê... em him nezan in û him jî li hevdu guh-dar nakin« Cindî got û gotina wî birî.
Evdo, »bêhna fireh, bêhna fireh... wê ew roj jî bê«.
Gulçînê bi şik û tirs got, »de ka ji xwe re qala tiştekî din bikin... hezar di kuçê re diçin û hezar tên... wê dengê we here hinan...«.
46 SORÊ GULÊ

Evdo, »rast e weleh... ma ka wê Ûsivo kengî bê?« got.
»Hîna wextê hatina wî nehatiye, hîna dinya germ e« Gulçînê got û rabû ser xwe. »Ez ê herim li xwarina xwe binerim... min îro hûn ji nêza kuştin« got û çû. Serdar da dû. Çûn aşxanê. »Ka te çi çêkiriye yadê« got û xwest rewşê bizanibe.
»Kurê min welehî gelek pere bi min re nemabûn. Ez çûm min dû kîlo goşt anîn... min tirşikeke bi goşt çêkiriye û min birincek jî di ber re daye ser«.

»Baş e, wê xweş be«.
Nûro, lawê Faroyê Omerî ket hewşê. »Merheba kek Serdar« got û him di ber re meşiya hêwanê û him jî »mêvanên me ez şandime... dolmîşa Hecî Emer hatiye, wê herin malê. Ma wê mevanên we jî bên« got û berê xwe da mêvanan. Deng çû wan. Hersêyan bi hevdu re gotin, »erê xwarzê, erê. Ma hima niha?«.
»Erê welehî, Hecî Emer gelekî ecelê dike«.
»Bi xwedê heta hûn xwarinê nexwin, hûn ji vê malê dernakevin« Serdar got.
Gulçînê ji aşxanê derket. »Li min qirikê, hûnê çawa bê xwarin herin. Qiyamet jî rabe ez we bernadim. Tew min jî dilê xwe xweş dikir û digot wê îşev li ba me bin« got û berê xwe da Nûro: »bila xwe hinekî ragirin... kirî çêbibe, bila firavîna xwe bixwin dû re. Ma xwene ferman e. Îro serê deh rojan e xwarin wek mirovan di qirika wan re daneketiye xwarê. Wey xwedê bike ko nema xwarin di qirika yên ko ev qase tadahî li wan kirin re, dakeve«.
Evdo »xuşkê, bila zarok bixwun, me qebûl kir, wek ko me xwar... ma xwene em ê te kêm bikin. Em ê zû herin malê, xem nake, çavên maliyên me jî li rê ne û hezar karên me ketine ser hevdu« got û destûra çûnê xwest.
Qaso û Cindî jî wek wî gotin.
Lê ne Gulçînê û ne jî Serdar xwe dan ber bazareke wilo. »Dinya xerab bibe heta hûn xwarinê nexwin, em we bernadin« gotin.
Nûro bi wê yekê bi paş ve şandin. Gulçînê bi xurtkirina êgir ve beziya. Serdar çû li ba xalan rûnişt û ew ragirtin. Piştî ne bi gelekî, Gulçînê û Sînemê dest bi kişandina xwarinê kirin. Serdar, firax ji destê Sînemê girtin û rast kirin. Dû re, îcar Gulçînê bi legana tirşikê hat û Sînemê jî bi a birincê. Hilma germ ji wan diçû. Bêhnê hêwan dagirt.

Evdo, »ohnan, welehî îro Gulçîna me qiyameta xwarinê rakiriye« got. Qaso û Cindî jî »erê welehî, ecêb rakiriye« gotin.

47

SORÊ GULÊ

Bi merdî dadanê. Gava hîna dixwarin, Nûro dîsa hat û qasidiya ecelekirinê gihand wan. Piştî bîstikekê Hecî Emer bi xwe hat û bi dengê xwe yê wek ê her carê kir qir qir. Gulçînê dengê xwe bi ser ê wî xist û xwest wî li ser sifrê rûnîne, lê »min xwariye. Gulçînê te îro ez dereng xistim, ez ê hîna herim tiriyê Talatiyan bînim« got. Gulçînê dîsa gotina xwe bi ser a wî xist û ew haş kir.

Gulçînê bi a xwe kir, ew bernedan. Xwarina xwe xwarin.

Gava rabûn, ji meşa wan xuya dibû ko meşa li ser wan nigên reş û werimî, janeke nedîtî dide nava wan... hersê jî dikuliyan.

***

Serdar gelekî li ber xalê xwe û Kurikiyên din ket. Ji bîra wî nediçû. Gava ket nav nivînan baştir tê ramiya. Pêşniyarên Xalit hatin bîra wî. Dît ko xebera wî ye. Dît ko gava zalim û keleş tune bin, wê azadî û xweşî li dar bin. Dît ko jîneke li ser hîmên hevkariyê ava bibe, geş e û mirovê ko lê dibin mêvan, şa ne. Welatekî geş û azad dihat ber çavên wî. Ne girtin, ne lêdan û ne jî tirs lê hebûn. Da dû wan xweşiyan û li nav geriya.

Dû re, Gulê dor saetekê bû mêvana wî, dest bi dana xweşiyên evîna êvaran kir. Gulê gelekî nerm û germ û merd bû. Serdar, li ser xweşiyên pê re, tavilê li cîhekî ket xewê.

Lê heçê Gulê bû, ew di nav lerz û kêf û xweşiya rojê tenê de bû. Cîhê tu tiştekî din di bal û hişê wê de tune bû. Li ser xweşiya xeyalên bi wî tenê re, di himbêza wî de dereng ket xewê. Sibehê gava çû dibistanê, hîna jî ew

lerz û kêf û dilgeşiya roja çûyî û xweşiyên êvarê, ên nav nivînan di bedena wê de bûn. Bedena wê bi wan xweşiyan hevdu girtibû û meyabû. Bextiyariya wê, ne wek a hemû rojan û a tu kesan bû. Bala wê û hişê wê hemû li ser Serdar bû.
Di navbira pêşî de, Serdar çû li ber rawestiya. Piştî çend gotin axavtin, tew dîtin ko herdu tenê mane. Ew bahoza ko do di dilê wan de rabûbû û hinekî aş bûbû, dîsa dîn bû û rabû. Cara yekem bû ko herdu bi hev re, wilo tenê diman. Ji ber wê yekê, xiroşî di bedena wan de girantir û bêdengiya li dora wan jî kertir bû. Destên wî hêdîka çûn bi aliyê Gulê de. Li nîvê rê bi wan hisiya, ragirtin û ma. Li ber xwe nerî. Ji xwe re »ev delala wilo teze, wilo giranbuha a min e... lê ez ê destên xwe nedimê« got. Şerm kir, li ber xwe nerî.
Lê di rewşên wilo de, dil û dest bi piranî naxwazin bi a êqil bikin. Dilê wî lê dixist û ew kila. Awira xwe hêdî hêdî hilda, lê nerî û bi dilovanî got

»Gulê, ez gelekî ji te hez dikim. Tu li ber dilê min pir spehî û şêrîn î. Ez bê şik im ko ez ê yeke ji te spehîtir nebînim... li yeke ko ez bikaribim ji te bêtir jê hez bikim, rast neyêm. Ez bêşik im... ez dixwazim heta ko ez û tu em dibistanê biqedînin, tu li bendî min bimînî û bi dû re jî bibî a min. Ez dixwazim tu bibî şirîka emrê min û bi min re pîr bibî... tu bi min re sed salan bikî û sed salên sax xweşiyê bidî min. Ez dixwazim vê yekê ji te re bibêjim. Ka tu çi dibêjî... ez nema xwe digirim«.
Gulê lê dinerî û mabû. »Çiqasî xweş dibêje, ji pirtûkan fêr bûye« ji xwe re digot. Lê xwe zû da ser hevdu û »ez jî pir ji te hez dikim, ez jî dixwazim sed salan bi te re bijîm... bawer be ez ê hew a te bim û li bendî te bim, soz« got.
Mebesta ko ji êvarê ve di dilê wan de bûbû çend gotinên wek bizotên

êgir û ew dişewitandin, bi dorê ji dilê xwe vala kirin û gotin. Soza giran ji hevdu girtin. Êdî rehên bedenê yên zewirî hevdu berdan, hêsanî ket bedenê û xweşiya jînê xweştir bû.
Wê Gulê piştî ne gelekî şazdeh temam bikirina û biketa huvdehan. Lê hîna wî çaxî tu nîşanên zaroktiyê lê nemabûn. Rengê xwêya pîrekî baştir lê xuya dikir, hilm û bêhn jê diçû. Bedena delal, xwestina dilan bi dîtina carekê tenê re di nav goştê nêr de dîn dikir. Êdî memikên wê nema wek berê bi şermokî hew serê xwe tenê di bin kirês de hildabûn, êdî mezintir bûbûn û li ser sênga wê belav bûbûn, fesaleke pîrekî ya spehî didan sênga wê. Kêlekên wê firehtir bûbûn û çîmên wê qalintir bûbûn. Êdî gava dimeşiya, goştê pîrekî li ser sêng û kulîmekên wê bi jêr û jor de dihejiya. Her babet tevsala pîrekî di bedena wê de ava û tekûz dibû. Bûbû numûneyeke spehîbûna pîrekî.
Serdar ew spehîbûn didît. Êş û şikên ko di nava wî de bûn, aş bûbûn. Nefeseke dirêj, tenik û hênik kişand û beşişî. Rehên bedena wî yên rakişiyayî hevdu berdan, hêsanî ket laşê wî û mêraniya wî hat bîra wî. Êdî bahoza xwestinên erotîkî bi awayekî dîn di nava wî de rabû û girt goştê canê wî. Kontrola li ser destan û bedenê zû wenda kir. Xiroşeke nerm ji ber ket bedena wî. Lerza şermokiya xortaniya nûhatî da goştê wî. Lê ew diajot ser. Destekî xwe bi lerza gava ko dil dike ji bo mirinê raweste, avêt ser stûyê wê, ê din jî avêt newqa wê û ji bo ko wê ji dev û lêvan maçî bike, ew
ber bi xwe de kişand. Tavilê wek gava cotkarekî tî, çaxê germa nîro devê xwe dixe ava kaniyeke sar di quntara çiyan de, devê xwe xist ê wê, ew maçî
kir û mijt. Dixwest wê bi maçîkirinê zuwa bike, hemûyî bimije û biçikîne. Tîna wî nedişkest.
49

SORÊ GULÊ

Lê mercên civatê giran bûn û zû hatin bîra Gulê. Mecbûrî parastin û hilanîna bedena xwe bû. Bi hêza êqil, rişmên xwestinên bedena xwe û dilê xwe girtin, kişandin û nexwest ko xwe wilo li rastan bi nav destan de berde. Bi nazdarî xwe ji nav destên wî şemitand, gavekê çû bi paş de û »na
ezîzê min, ez tika dikim, ez hew a te me, ez ê heta çaxê tu bibêjî, li bendî te bim, lê niha li vir destên xwe nede min. Ez jî te dixwazim, lê ne li vir, na... careke din, li cîhekî xewle... şevekê were pişt mala me, li wir. Lê li vir na, wê hin bên me bibînin. Ne îro, rojeke din... li cîhekî din...« got.
Wek roviyê ko kevok ji nav lepên wî bifilite li Serdar hatibû. Bêdeng û bêlebat lê dinerî û mabû. Poşman bûbû. Şerm dikir. Şerma ji ber şkestinê, ji ber biserneketinê, ji ber bidestnexistinê bû. Şerma ji ber red-bûnê bû. Şerma ji ber êrîşa ko biribû ser rastiyê bû. Didît ko xebera wê ye. Heqîqet çi be bila bibe, didît ko ji ber rewşa civatî xebera wê ye. Tavilê ev yek bi hejandina serê xwe jê re diyar kir. Xwe deyindarê ravekirina ki-rina xwe dît. Bîstikekê ma û got »bibuhure Gulê... ma ne tu dibînî Gula min, delala min... ev yek bi gelek awan li me qedexe kirine. Tu delala min î, ez dixwazim te maçî bikim û ez bawer im ko tu jî dixwazî min maçî bikî, lê mixabin em nikarin. Ji ber ko heger hin me bibînin, wê navekî xerab bînin ser min û te. Tu dê bibî a min, me wilo li hev kiriye, lê dîsa jî qebûl nakin. Rast e, xebera te ye, wê xelk me bihetikînin. Ez naxwazim ko tiştên wilo bên serê te. Min bibexşîn, ez nizanim bê min îro çima wi-lo kir. Heger tu rastiya wê dixwazî, ez ji destê xwe derketibûm û bê kon-trol bûbûm. Tiştekî ko ez bi ser te de didahfandim û min xwe li ber ne-girt ketibû nava min. Min xwe li ber nedigirt. Ax, ev civata me... bawer be bi qasî ko min xwendiye û bihîstiye, li tu deveran ne wilo ye. Ma gelo

çi xeletî di vê yekê de heye. Bawer be ev yek, hew li çend welatên me mis-
ilmanan tenê qedexe ye. Wek li hemû welatên misilmanan, hîna me xortan li vir jî şoreşa xwe nekiriye, me xwe ji mercên jîna civatê û ên olî û exlaqî yên kevnar azad nekiriye, me jîna xortaniya azad bi dest nexistiye. Em xortaniyê najîn. Bawer be xortên xelkê ne wek me ne. Ew azad in. Lê em? Em, na! Em dîlketî ne. Bawer bik her tişt li me hatine qedexekirin. Ya em zarok in û ji gelek tiştan bê par in, ya jî em pîrek û zilam in û em dikevin bin berpirsyariyên civatî, exlaqî û aborî yên giran«.
Lêvên wî diricifîn, îcar lerza hêrsê ketibû dengê wî. Serê xwe hinekî daxist ma.
Gulê, »ez jî wilo bawer im, tu rast dibejî. Lê... lê dîsa jî ez hêvî dikim dilê te ji min namîne« got.

»Na Gula min, xebera te ye, dilê min qet ji te namîne. Lê bi baweriya min, ev yek zîndanîkirina hêleke mirovan tevî ye; bi qeyd û zincîrên pir qalind û kevnar girêdan û zeftkirina azadiya xwestinên mirovan e. Lê xem nake Gulê... xem nake. Em ê jî rojekê wê şoreşa xwe bikin, azadiya xwe bi dest bixin. Ma nexwe doza me çi ye! Bila ên bi dû me re, ne wek me bijîn. Bawer be, ew ê azad bin û dilşa bin. Belkî dema ko zarokên me bibin wek min û te, wilo bibe«.
Gulê bi dilgeşî dibeşişî. Xwe wê bîstikê, dêya komeke zarokên wî didît. Çi dilgeş bû. Êvar bû. Zarok hîna li kuçê di lîstikan de bûn, bebek razabû. Dor, a xwespehîkirina wê bû. Li ber mirêkeke mezin bû û li xwe dinerî, xwe şeh dikir. Çaxê hatina wî ya ji karî bû. Şîv çêkiribû, amade bû, li bendî wî bû û êdî xwe ji wî re spehî dikir. Êdî bi awirên dawî li xwe dinerî. Kirasê wê gulgulî bû, porê wê bi ser de rijiyabû û li mala xwe û wî,

xatûna wî bû û li bendî wî bû. Hima ko bihata, wê ew himbêz bikira, ew maçî bikira û hîna bi dû re wê biçûya gazî zarokan bikira.
Êdî herdu bêdeng mabûn û li hevdu dinerîn û dibeşişîn. Lêvên wan diricifîn. Bi xiroş bûn. Tiştekî din ê negotî, nema dihat bîra wan.
Bêrîvanê zanîbû ko herdu tenê mabûn. Berî hemû kesan hat jor. Xwe nêzîkî herduyan kir û got »welehî heger hûn wilo bikin, hûn ê bibin benîşt û di devê xelkê kevin... hinekî hêdî hêdî lê herin«.
Bi awayekî nîvtawanbar, »me tiştek nekiriye, em ji xwe re diaxivin« gotin.
»Ez dizanim ko hûn ji xwe re diaxivin« bi henekî got û bi dû re, »lê ma gelo wê xelk jî wilo bibêjin«.
Serdar, »rast e, bibuhur... em ê careke din tiştekî wilo nekin... yanî em ê tenê nemînin... em ê carê li ber çavan bin« got.
***
Roj dilgeş dihatin û her wilo dilgeş diçûn. Hezkirineke bêşik û qewîntir di nav wan de ava dibû. Êdî xwe ji hevdu re hisab dikirin. Pêşeroj, jîna wan a hevbeş bû. Ji ber wê yekê, her rojê û her gavê tiştên ko ji hevdu re bigotina û li ser bi hevdu bişêwiriyana hebûn. Sextiyên ko carnan jînê derdixistin pêşiya wan, kul û xemên wan û her babet dilgeşiyên wan hevbeş bûn. Êdî ên hevdu bûn. Dildarî û sozdariya wan, ji dibistanê tevî ve eşkere bûbû. Hin kêfxweş dibûn û hin jî zikreş. Lê êdî wan jî nema pir guh didan xelkê. Çaxê ko hewa û dinya xweş bû, li derve, li cîhekî nîvx-
51
SORÊ GULÊ

ewle radiwestiyan û diaxivîn û zivistanê jî li korîdorê, li ber paca mirêka başûr radiwestiyan û diaxivîn û bingehê jîneke hevbeş dihûnan...
Heta zivistan hat, êdî hevdu baştir naskirin û gihan ko gelek tiştan ji

hevdu re bibêjin. Jîna bi dilketinê xemilî, xweşiyeke bêhempa bû. Xweşiya dilê xortanî ya ko di dilê wan de hatibû hûnan, roj bi roj be-dewtir dibû. Êdî xwe li ber nedigirtin. Bi awiran û gotinên sergirtî ji hev-du re digotin bê çi ji hevdu dixwestin. Tavilê ji hevdu re gotin. Hîna berî ko şevên çile ên reş û ker herin û cîh bidin şevên buhara ruhnî û geş, şevekê, piştî eşayê, li pişt xênî civan dan hevdu. Dor nîvsaetê bi hevdu re tenê man. Nîvsaetê bi maçîkirin û firkandin û himbêzkirinan, cara pêşî gihan hinek tahma xweşiya xortaniyê. Dîtin bê gava ko du bedenên nêr û mê nêzîkî hevdu dibin, çi dibe û çi xweşiya nedîtî bi hev re û ji bo hev diafirînin. Herdu nîvsaetê di nav de heliyan. Gava Gulê çû hundur, Sêvê, ji hinarkên wê yên sorbûyî, lêvên wê yên sipîçolkî û werimî, ricf û xiroşa ko ketibû bedena wê û bêhna wê ya çikiyayî, tê derxist bê çi û çi kirine. Kê ew wilo bidîta, wê tê derxista. Destê wê ket dilê wê. Ew zû bir oda mê-vanan û hin şîretên xuşkan û mezinan lê kirin. »Divê we a dawî nekiribe... hevdu bibînin, lê divê hûn hin tiştan nekin... sozê bide min« got. Gulê soz da û baweriya wê anî ko ji maçîkirin û firkandinê bi wir de neçûne. Sêvê çû av jê re anî û lewento bi ser dakir, ew ji nav xiroş û xeyalan vegerand û şidand. »Hevdu bibînin, lê divê hûn hin tiştan nekin... sozê bide min« got. Gulê soz da, lê dîsa jî hevdu careke din bi wî awayî nema dîtin. Nema wêrîbûn. Ji hevdu re eşkere gotin û li hevdu kirin ko wê nikaribin xwe li maçîkirinan ragirin.

Heta dem bû buhar, Misto û Serdar jî bûn du hevalên pir nêzîkî hev-du. Çend carekî bi malbatî ser dan hevdu, hevdu gazî şîvê kirin û şevbuhêrk bi hevdu re buhartin. Bûbûn wek malekê.

Zivistan wilo çû û buhara rengîn hat. Germê û tîrêjên roja zêrîn bi awayekî din dan berojê Bagokê û Nisêbînê jî dan ber xwe. Dinya dix-emilî, dil dikemilîn, geş dibû û beden germ dibûn. Serdar û Gulê jî dem-saleke din mezin dibûn. Hêviyên di dilê wan de, xwe li hevdu digerandin

û wek çinareke di devê çemê Newala Bûnisra de bilind dibû. Wek ko ahd dabû ko wê bigihije ezmên, dikişiya. Her rojê bilindtir û geştir dibû. Dema serma zivistanê hêdî hêdî cîhê xwe dida germa buhara jîndar, gava êdî qeşa diheliya, axê hevdu berdida, hilm û bêhn jê diçû û repin ji nav dikişiya, av di şax û rehên daran digeriya, bêhna geşiya evîna wan bi xwe jî di gulîstana dilên wan ên ciwan de dest pê kiribû û difûriya. Dilan,

gerdûna dinya xwe hemû bi wê hilm û wê bêhna nû, hêdî hêdî dadigirtin û xweş dikirin. Xwestin û hêviyan, xwe li hevdu dipêçan û diçûn di mêrgên dilan de, li deverên xweştirîn seyran dikirin û dû re dihatin xweşiyên ko jiyabûn ji wan bi xwe re eşkere dikirin, ew li xweşiyên jîna xortanî sortir dikirin. Êvîndarî di dilên wan de rabûbû pîkolê û ew dihejandin.

Gulê bi xwe bûbû wek dareke li ber bahozeke pir xurt, xwe bi kotekê digirt. Hedanî di bedena wê de nemabû. Pêşeroja wê ya bi Serdar re, li ber

çavên wê, wek roja ko tije jîn bû diçirisand. Dilbijîna wê bêhedan bûbû. Dilbijîna wê, bûbû wek aveke li kelê û wilo di rehên bedena wê de digeriya. Pir germ bû, ew dişewitand. Êşeke germ û xweş dida bedena wê. Ew êşa ko buhar dide hemû tiştên nêr û mê bi xwe bû.

Wê salê buhar zû hatibû çiyan û dilan. Hilm û bêhneke bê dawî ji dinyê diçû! Buhara di deşt û çiyayên dilê wê de, buhareke ji buharên her salê cu-

da bû. Buhareke dîn û har bû. Gulê hema dîtibû ko êdî qîzeke gihayî ye û sor û şêrîn dibe. Xweşiya ko buharê bi xwe re dianî û diyarî bedena wê dikir, di temamê bedena xwe de his dikir û tahmeke bêhempa jê digirt. Gava carê serê xwe dişuşt, tibabekî li xwe dinerî û xwe dipîva. Him ser-

bilind dibû û him jî êşeke kamax dikişand. Pîrekbûn, bi êş û jan û evîndarî di bedena wê de ava û tekûz dibû. Êdî hêza hezkirinê û xwestinên pîrekî, bedena wê dagir kiribûn. Du hêzên pir xurt bûn. Ew zû girtibûn. Dinya li dora Serdar jî, bi evîndariyê tije dilgeşî bûbû. Xweşiyeke nedîtî xwe berdabû ser goştê bedena wî û dilê wî. Hêviya wî bilind bû, şik û taswas ji dilê wî derketibûn. Pêşeroj yekser geş û ewle bû. Dilê wî bi xweşiya wê yekê nepixîbû. Bedena wî xwe li hêsaniya wê xweşiyê pêçabû.

Bedena wî li dilê wî sivik dihat. Wek nepoxeke li ber bê bû. Wek ko difiriya lê dihat.

Buhar demsaleke cuda ye. Xwediya taybetiyên cuda ye. Merd e, xweş e, geş e. Gava çiyan bi hatina buharê re hêdî hêdî kirasekî kesk li xwe dikirin û êdî ji herdu bajaran xweş diçirisandin, evîndarî xweştir dibû. Buhar demsaleke erotîk e. Ew diyariya merdbûna xwe ya taybetî berdida bedenên bi xwîn û goşt. Ew yek, vatiniya ko sirûşt dide hemû tiştên bi can û xwîn û jîn e. Piştî ko ew merdî dikeve rehan û bedenê, êdî xwestineke bêhedan e tiştê ko wan germ û xurt dike û dajo ser mecala aşkirinê. Ev yek, di jîna heywan û çûkan de eşkere ye. Bi lep û lapûşk û diranan êrîşî hevdu dikin û xwe jê bêpar qebûl nakin. Ji xwe nikarin bikin. Mercê jînê û xwezêdekirinê ye, misoger e.

53

SORÊ GULÊ

Kar û lebat û xwestina xwezêdekirinê, armanca buharê ye. Em mirov jî di ber de ne. Dinya wilo ava bûye û nifş wilo ji hevdu zêde bûne. Bapîrên me, bapîrên wan bapîran bi xwe, bi hezar salan ev yek ji me re anîne û dane me. Vatiniyek e. Nifşek digire, dijîne û bi dû re dide nifşekî din. Dor e. Hin tên, dorê dikin û berî ko herin jî didin hinên din. Êdî dora

Gulê û Serdar û nifşê wan bû. Ji ber wilo bû ew û ên din êdî hêdî hêdî bi vatiniya xwe radibûn, wan jî dikirin ko dora xwe bikin.
Lê ew dara evîndariya di dilê Serdar de, wek ko ji nifşkê ve birûsk li dareke heyaman bixe, lê hat. Hinek jê hilweşiya. Buhar, wek ko dihat neçû serî. Geş dihat, xweş dihat, lê bi êş çû. Serê buharê bobeleteke xaîn hat serê malbata wî û ew jîna ko ketibû ser rêya hêviyên geş, birîndar kir û çû.
Xwezî felek ne xaîn ba
geşiya dilan her daîm ba
jîna li dinyê tim rengîn ba
cîhê êş û kulan nav êgir ba, hêtûn ba...
***
Lê feleka xopan xaîn e, xweşiya dilan ne her daîm e, cîhê êş û kulan ne nav
êgir e, ne tu hêtûn e. Cîhê wan, dilê reben e, nav goştê nerm û germ e. Çawa!
Xwediyên êş û kulan rastiya vê yekê baş dizanin. A rast, êş û kul dibin mêvanên dilê hemû kesan. Tên naskirin. Lê dîsa jî divê çîroka xaîntiya felekê bê gotin. Divê bê gotin bê çawa difitile û ji nifşkê ve ji paş de li mirov dixe. Divê herî ji serî ve bê gotin. Ji bo ko derkeve bê çawa digere û li ên ko serê bennê xweşiyên jîne zeft kirine dixe.
Serdar lawê Ûsivê Mûsik û Gulçînê bû. Berî pazdeh-şazdeh salekî ji ber xizaniyê, ji herêma Omeriyan, ji gundê Talatê bar kiribûn Nisêbînê. Ji Talatê, ji mala Mûsik in.
Mala Mûsik di wextê xwe de pir halxweş bûn. Lê her ko malbat mezin bûbû, milk li hevdu par vekiribûn û her ko jinek anîbûn, hinek ji milkên mayî tê de dabûn û lawaztir bûbûn.
Tahirê Ûsiv, bavê Ûsivo, şaxekî ji malbatê bû. Di wî şaxî de, heta çaxê

Tahirê Ûsiv bi xwe jî miribû û Ûsivo û her sê birayên xwe jî para wî li hev-du par vekiribûn, êdî axa mayî, nema pareke lê hejayî bû. Nema abora tu

kesan ji wan, bi tiştên ko mabûn, wek berê dibû. Halê pismaman jî gi-habû doşeke weha.
Heger rewşa mirov a aborî wilo be û qaîşkêşiya gundan û darên cendirman jî têkevin ser, êdî barkirin dibe qeder û tê serê mirovan. Ûsi-vo bi xwe jî wilo bi a qederê kiribû. Bi dû hêviyê de bar kiribû Nisêbînê. Li taxê, bi navê mala Gulçînê dihatin naskirin. Her demê Gulçînê li ber çavan bû û ji ber wê yekê jî navê malbatê, bi navê wê dihat hildan. Ûsivo pir ne li malê bû, gelekan ji taxê ew nas jî nedikirin. Gulçînê bû, her tişt ew bû.
Ji wî çaxî ve, komek çêlîk bi dû Gulçînê ketibûn. Serdar na, lê ên din hemû li Nisêbînê çêbûbûn. Ji xaniyê wan û erdê wan ê li Qamîşlokê pê ve tu tiştên wan ne li Talatê û ne jî li bajêr hebûn. Du ode û salonek û piçek hewş bû. Para wan a ji dinyê, hew ew bû. Ji bo ko mirov bi dû re derewîn dernekeve, divê bê zanîn ko aşxaneke wan a biçûk jî di hewşê de hebû. Mala wan, li taxa Qijlê, li dawiya Kuça Belengazan, xaniyê çaran bû.
Dema Ûsivê Mûsik û Gulçînê ji Talatê bar kiribûn, Serdar kiribûn ber himbêza xwe û mala xwe ya wekî din jî, hemû li herdu kerên xwe kiribûn. Wî çaxî Gulçînê bi zikê duyem ducanî bû. Kîjan sal bû, ew bi esehî nayê zanîn. Lê li gor ko dibêjin, piştî ko Hisreto trên tazî kiribû bi du salan bû û dem payîza paşî bû. Xelkê medbexên xwe nû hilanîbûn û nû dest bi ser-jêkirina dermalên xwe kiribûn.
Wî çaxî, sedek dudu erdê wan, cotek rezê wan û çend bizinên wan hebûn, ew jî wî çaxî firotibûn birayên xwe û xwe ji binî ve ji Talatê qut

kiribûn. Li ser hevdu heft alme kiribûn. Piştî ko mala xwe anîbûn, herdu kerên xwe jî firotibûn. Gava barkirin eseh bûbû, Kurikî wek mişterî li wan rabûbûn. Ji ber wê yekê, herdu ker dîsa vegerandibûn Kurikê û dabûn xwediyên wan ên nû. Kerên wî baş bûn. Ciwan û xwedîkirî bûn. Him ji bo ko bikaribe bi wan cotê xwe bike û him jî di navinan re êzingan ji gundê Serê Kaniyê, ji himiya Zibêrê mala axê, bibe Nisêbînê û bifiroşe bûn. Wan jî du almên bûkan anîbûn. Ûsivo almên xwe li bajêr firotibûn û li ber xwe gerandibûn. Bi wan peran ew xaniyê ko hîna tê de ne, çêkiribû.
Talatê gundekî mezin û kevn bû, dor sed malekî hebû. Pazdeh mal jê Mûsikî bûn û Talatiyên kevn bûn. Zuriyeta xwe heta heft bavan dihejmartin û diçûn. Ûsivo, lawê Tahirê Ûsivê Mûsik bû, Tahir lawê Ûsivê Silêmanê Mûsik bû, Ûsiv lawê Silêmanê Şamilê Mûsik bû, Silêman lawê

55

SORÊ GULÊ

Şamilê Xalitê Mûsik bû, Şamil lawê Xalitê Eliyê Mûsik bû, Xalit lawê Eliyê Mûsik bû û Elî jî lawê Mûsik bi xwe bû. Ji Mûsik pê ve nikarîbûn herin, nizanîbûn bê kî hebû.
Mala Mûsik du jin dabûn mala axê. Bûkeke wan (jina Şamil, dêya Silêman) û yeke mala axê xuşkên hevdu bûn. Li gor ko tê gotin, gava ko law ji wan re çêdibin, navên herduyan dikin Silêman. Navê mala axê, bi dû re êdî bi wî Silêmanî dom dike, lê ê mala Mûsik wek berê dimîne. Ew û mala axê her demê ên rêzekê bûn, merevên hevdu bûn. Çar mêrên wan di ber mala axê de hatibûn kuştin.
Di zincîra ko ji Ûsivo zêde bû de, navê Mûsik, li Serdar qediya. Jê re Serdarê Gulçînê dihat gotin. Lê navê Mûsik, li ba pismaman, hîna wek berê berdewam bû. Ew navê serbilindiyê bû. Çi bavikê ko hebû, rêza xwe

dihejmart û xwe digihand Mûsikê pêşî. Lê piraniya wan, li ba Şamil bi rêzê re dibûn yek.
Heçê Gulçînê bû, ew jî ji gundê Kurika Buhurî bû, ji newala Stilîlê bû. Keça Esedê Xudoyê Şakir bû. Navên bavan zû li ba wan dihatin jibîrakirin. Her demê sê bavan têra wan dikirin.
Ûsivo Talatî û Gulçînê Kurikî... çîroka evîndariya wan dirêj û balkêş e. Dibêjin ko rojekê ji rojan, rojeke serê payîzê, Ûsivo tê êş. Talatê û gundên der dorê bej bûn, av û aş lê tune bûn. Carê ji bo karên wilo, xwe berdidan newala Stilîlê.
Wî çaxî sala Ûsivo qediya bû ko eskerî kiribû. Dora zewaca wî ketibû berî dora hemû tiştan. Simbêlên wî di bin guhên wî re derdiketin. Xelkê ew bi tiliyan nîşanî hevdu didan. Gelek qîzên Talatiyan, çav berdabûnê û li ser wî ruh dabûn, lê wî bi xwe çavên xwe digerandin û nedigerandin, yeke li gor dilê xwe nedidît. Êdî dereng jî ketibû. Birayên wî yên biçûk, Xalit û Etman jî dildar û sozdar bûn û êdî sozdarên wan zor didan wan. Lê soxî xwe li bendî wî radigirtin. Ûsivo ev yek jî zanîbû, lê anîna jinekê, ne wek kirîna cotek çarox bû.
Ûsivo, berî nîro digihije Kurikê. Aşê jor qonaxa çixarakê di binya Kurikê re bû. Li binya gund, li ser çemê ko ji bin çiyayên Hebîsê derdikeve, her ko tê mezintir dibe û ji nav bîhik û çinaran ji nifşkê ve derdikeve ser rêya gundên Omeriyan, dibire û dadikeve ser aş û bexçên Stilîliyan, li Gulçînê rast tê. Wek kevoka ko dakeve ser avê, hûrik hûrik dimeşiya û ji hêla gund ve pêrgî wî ve dihat ser çem. Li wir, li ser çem, mirov xwe ji ser kevirekî diqevast ser yekî din û ser yekî din û wilo di çem derbas dibû. Ew kevir ji sal û heyaman ve li wir bûn. Hew bi qasî ko li ber

lehiyê neçin mezin bûn, bi qasî elbekê û du elban hebûn. Her ji buhus-

tekê du buhustan yek hebû, bi rêzê bûn. Têra ko du mirov bikaribin pêrgî hevdu ve herin, nedikirin. Ûsivo radibe rê dide Gulçînê û li aliyê din dimîne. Lê gava ew wek kevokan xwe ji ser kevirekî diqevêze ser ê din û dike ko derbas bibe, Ûsivo bala xwe dide bejin û bala wê, cotê memikên wê, goştê ko li ser rahn û kulîmekên wê diheje... awira xwe ji wir hildide ser rûyê esmer û gurover, lêvên tenik, çavên reş ên belek, birûyên qelemkirî û deqa di çenê de. Xwîna wî li wir di nav goştê bedena wî de lê dikele û difûre. Hiş û aqil berdide, qolincên dilketinê digirin dora dilê wî. Xwe li ber wan nagire û diçe wê li ser kevirê dawî radigire.
Gulçînê wî çaxî hijdeh salên sax kiribûn, di kemala xwe de bû. Xortên ko xwe tê dernexistibûn, di wê newalê de tune bûn. Lê hêvî qet nedida tu
kesan. Bûbû wek hinareke ko heta derengê payîzê di dara xwe de bimîne. Reng û tahm lê tîr û tarî bûbûn, stewiyabûn û xwe lê vedabûn. Hindik mabû Şêrîna biçûk bigihije û mêr bike, lê ew hîna jî li malê bû. Heger ew yek bihata serê wê, hetîketiyeke mezin bû. Lê tê gotin ko mirov ilehî li bendî nesîbê xwe dimînin. Xuya ye ko rast e. Li bendî Ûsivo bû. Ji ber wê yekê Ûsivo bi dîtina pêşî bi heft dilan dildikeve wê. Ûsivo radibe wek mêran bi a dilê xwe dike û li wir »keçê qîzê, navê te çi ye û tu qîza kê yî... tu çi şêrîneke kesan nedîtî yî... heger tu min bikî, ez ê xwazgîniyan bişîn-im te« dibêje.
Gulçînê, »li min rebenê, kuro xorto tu dîn î... ma hima wilo li ser rê û rastê tu derketiye pêşiya min... bavê min heye, birayên min hene, pis-manên min hene... bawer neke ko ez bêxwedî me... wê wek guran te li hevdu hilînin... ma qey xwîna te ketiye çavê te...« dibêje lê Ûsivo gotina wê dibire û dibêje: »keçê qîzê welehî bila hemû şêr û piling bin û bên min, lê ez dîsa dev ji te bernadim. Ez bi dîtina pêşî bi heft dilan dilketime te... ma ez ê çawa rabim dev ji te berdim. Ez li sed û sîh gundên Omeriyan

geriyame, lê ez heta îro li şêrîneke wek te rast nehatime. Ez ne bêbext im,
ne xeberok im û ez ê tu caran jî li kevaniya xwe nexim. Ez ne ji dewle-mendan im, lê ez ne ji xizanan im jî. Wekî din, vaye ez li ber çavên te me. Ka tu jî baş li min binere... heger ez di serê te kevim, ez nû vegerim malê, ez ê xwazgîniyan bişînim te«.
Gulçînê, »kuro xorto welehî tu dîn î, tu wilo roj nîro derketiye pêşiya min... dev ji min berde... hilîne ji ser rêya min, xwe bide alî... wê hin me bibînin... ma min îro çi kir ko ez rabûm ji malê derketim û min bela te anî ber deriyê bavê xwe...« dibêje, lê Ûsivo dîsa gotinê ji devê wê digire û

»na qîzê, ez ne dîn im... lê heger ez dîn bim jî, ez li ser te dîn im. Belkî rast e, êdî ez jî tê derdixim ko hiş û aqil bi min re nema ye... de ka min bike, ez te dixwazim. De... heger navê te bi xerabî derneketibe û heger tu şer-mezarî li ser te ne geriyabin, were bibe kevaniya min« dibêje.
Hat bîra Gulçînê ko êdî xelk, »weleh wê Gulçînê di mala bavê xwe de bimîne. Heta îro tu mêr nekirine û nema dike jî. Êdî xelk jî nema tên wê dixwazin« dibêjin. Tirs diniqute dilê wê. »Heger tiştê ko tê gotin rast be!« ji xwe re dibêje. Awira xwe hildide û li xeta simbêlên qeytanî, li biska tem-beriya wek têlên tembûrê zer ko ji bin kumê tiftik filitî bû ser eniyê, li çavên zer ên awirtûj, li bedena zinde wek a dergevanan dinere û sist dibe. »Yekî wilo dikare mirov ji keriyek gurên sibatê biparêze... xortekî çê ye« di dilê xwe de dibêje. Ûsivo dikeve serê wê û tavilê, »na xorto, ez qîz im, ez pak û bi rûmet li mala bavê xwe me, li bendî camêrekî wek te me. A rastî, gelek hatine û ez ji bavê min xwestime... bawer be ên bi qasî axan

spehî, bi bejin û bal hatine... zêrên zer li ser cila bavê min vala kirine, lê ne min ew kirine û ne jî bavê min ez dame wan. Heta îro dilê min nebi-jiyaye tu zilaman. Lê xuya ye xwedê navê te li ser eniya min nivîsiye û tu îro wilo ji nifşkê ve derxistiye pêşiya min û li min kiriye bele. Îcar madem tu wilo wek camêran derketiye pêşiya min, min jî tu qebûl e... de ka bila xwazgîniyên te bên. Lê ez sozê didim te û ez êdî dibim a te. Heger tu li min biqulpî, ez dû re rojekê nikarim ji hinan re bibêjim ez qîzeke pak im. Xaîn dernekeve... ez guneh im. Were min ji bavê min bixwaze, lê heger bi wî awayî nebe û heger tu rast dibêjî, dîsa were li min bipirse, mêrekî çê
be û min bi kotekê bibe ji xwe re. Lê heger tu neyê, ez ê bawer bikim ko zilam hemû bêbext û derewîn in... ez ê bi dû re zewaca mêran li xwe her-am bikim û li darê dinyê tu mêran nekim, ez ê serê xwe bi tu mêran re daneynim ser balîfekê« dibêje.
Gava wilo dibêje, Ûsivo ji ber kêfê û xweşiya bayê dilketinê dike bêhiş bikeve ber nigên wê û ruh bide. Di dilê xwe de »madem wilo ye, tu êdî ma a min qîzê« dibêje. Ji xwe re lê dinere û dimîne. Hiş û aqil di serê wî de namîne. Gava piştî bîstikekê tê derdixe ko îcar dora axavtinê a wî bi xwe ye, ji nav xweşî û xiroşa dilketinê vediciniqe, li xwe vedigere û destê xwe datîne ser qebza xencera xwe û »keçê qîzê, ne adeta min e, ez qet zirt
û fortan nakim... lê ez Ûsivê Tahir im, ez ferxê mala Mûsik im, ribatê do-ra Talatê me. Heta roja îro, ez li mêkewa xwe rast nehatime, ji ber vê yekê jî min tu caran nexwendiye. Lê heger tu qala bextê min û mêraniya min bikî, ez wî çaxî deyindarê gotinê û xwendinê dibim. Heta roja îro tu ke-

san nehatine sozdarên me ji ber me nebirine. Mala Axê jî xwe di vî warî

de di me dernexistine. Bi soza mêrê çê, heger bi xweşî bû, bû... lê heger bi
xweşî nebû, heger ez bizanibim ko wê çira me li dinyê vemire, em ê bi malbatî biqelin jî, ez dîsa têm te bi darê zorê dibim ji xwe re. Soz û qerarên xwedê li can û cesedê min ketibin, ez nahêlim ko di saxiya min de destên mêran bigihijin te. De aniha bi xatirê te. Lê heger heta deh rojan xwazgîniyên min neyên ser cila bavê te, xwe ji revandinê re kar bike. Ez êvara roja dehan, li ber derî me. Hêvî dikim ko bi xweşî bibe. Lê heger xwazgînî bên û bavê te, te nede, êvara ko xwazgînî şkestî ji mala bavê te vegerin, ez li ber deriyê we me« dibêje û rê dide Gulçînê.
Piştî ko Gulçînê »baş e, qewlê me ma wilo« dibêje û digihije ko du gavan ji ba wî rade, Ûsivo ji paş ve gazî wê dike û wê dîsa disekinîne. »Keçê qîzê ma ka te navê xwe ji min re negot. Ê min bi xwe Ûsiv e... ma ê te çi ye... ez ê bavê xwe bişînim mala kê« dibêje. Gulçînê disekine, li xwe difitile, bi nazdarî dibeşişe û »Gulçînê ye... Gulçîna Esedê Şakirê Xudo« dibêje û bi rêya xwe de diçe.
Ûsivo, »de baş e... xwedê mezin e« dibêje û ji nû ve dide rê û diçe êş. Ûsivo, wê rojê, dildar û birîndar vedigere malê. Isma hedanê di bedena wî de namîne. Diçe ji malbata xwe re, min Gulçînê diye, hûn ê rabin wilo û wilo bikin dibêje. Rê li ber wan datîne û gotinê dibire. Dibe xetereke biyan û dikeve stûyê wan. Êdî wek berê ko ji devê tivingê derkeve, nema ne vedigere û ne jî tê girtin.
Piştî sê rojan xwazgînî diçin Kurikê. Lê ew heta ko vedigerin, ew bi xwe jî li malê tivingê yax dike, pakêtan lê dixe û vala dike, rextan dadigire û rast dike û xwe ji rêya din re kar dike. Çar xortên Mûsikiyan ên din jî bi xwe re kar dike. »Hûn jî herin tivingan derxin gelî pismaman... çi dibe û çi nabe... heger nedin, hêvî dikeve darê tivingê, em ê herin bi darê kotekê bînin. Nêta min ko ez herim wek Cembelî şivantiyê bikim tune ye« dibê-

je.
Pismam bi kêfxweşî diçin tivingan derdixin. Mahne ji wan re dikevyê ma êdî kî dikare tivingan ji destên wan derbixe. Amade ne ko gundê Kurikê tevî li ser Gulçînê bidin ber tivingan û bikin serada nikarê. Lê ew yek qet hewce nake. Talatî û Kurikî li hevdu dikin, Gulçînê ji Ûsivo re dixwazin, serê wê girêdidin û tên malê. Xweşî, wilo zorê betal dike û xort tivingan dîsa hiltînin. Û wê rojê, Ûsivo tobe dike ko wê tu carên din nema destê xwe bide darê tivingê. »Heger ez vê mîratê daneynim, wê rojekê
ilehî min û Gulçînê ji hevdu dûr bixe. Ji bo xatirê belekên çavên wê, tiv-

ing li min heram be« dibêje.
Pismamên wî pêşî bawer nakin, lê bi dû re dibînin ko Ûsivo rast gotiye. Ev yek dibe kêmasiyeke zilamtiya wî û qedir û qîmetê wî di nav pismaman de zû dikeve. »Wey li vê ecêba nedîtî... Ûsivo ji bo kevneke jinan rahiştina tivingê li xwe heram kiriye« tê gotin. Lê Ûsivo guh nade gotinan... ji bo xatirê Gulçînê bi a xwe dike.
Li gor ko tê gotin, wê payîzê nagihijin ko Gulçînê bibin. Heta sal dizîvire a din û berf ji erdê radibe, rê vedibin, qeşa dihele, axa bi ber hevdu berdide, zîpik diçin û pilingê dawî dikeve, av di daran digere, bilbizêq çêdibin, beîv kulîlkên pêşî vedikin, roj ji germiyanan vedigere, dinyê ji bo jînê, dilketinan û dîlanan germ û xweş dike, ji nû ve wê diguhêzin. Heta wî çaxî incex digihijin rezê xwe yê di nav hidûdên Sada de bifiroşin, qelenê wê û peran ji bo mesrefên din peyde bikin. Heta wî çaxî, xortên nûhatî jî digihijin ko qoçanîkan bihûnin, xenceran di ber xwe xin û xwe fêrî reqsê bikin. Ên mezintir digihijin ko kum û şewqan biguherin, piş-

tan û kejiyan bikirin, şal û qutikan bidirûn, gorên rengîn çêkirin bidin û çaroxan nerm bikin, simbêlan henne bikin, fîşekan peyde bikin û nîşanê bifirînin. Qîz jî incex digihijin ko desmalan biguherin, kirasên dawetê bidirûn, pişt û gulik û rêşîkên rengîn bihûnin, por hinne bikin, berbiskan bikirin, morîk û mircanan darvekin, kildanan tije kil bikin, xemla xwe tekûz bikin û herin dawetê.
Bi rojan û mehan li dor xwe diçin û tên. Dibêjin ko dawetên mala Mûsik bi nav û deng bûn. Hîna ji roja pêşî ve xuyabû ko wê daweta Ûsivo û Gulçînê, erdê û ezmên bihejîne. Tu kes hêvîşkestî nabe. Wilo derdikeve. Şikriyê Fafî û Xidirê Omerî herdu li ber hevdu dibedilin û heft şev û heft rojan dawetê digerînin. Qîz û xortên wan gundên wê derdorê, heft şev û heft rojan di daweta wan de direqisin. Di milê hevdu de dîn û har dibin û reqsê xurt dikin. Gava Xidir lê dixe dîntir dibin. Şewqe û epirî ji serên wan dikevin, pişt ji piştên wan difilitin, çarox xwe di nigên wan de nagirin, perçe perçe dibin, lê dawet her rojê xweştir û mezintir dibe. Wî çaxî derdikeve bê çi reqs li ber Xidir dibe. Xelk dibihîzin. »Baweriya we ji xwedê hebe, wek Ûsivê Çelebî xweş dike« tê gotin. Gava xelk wilo dibihîzin, xwe nagirin, cotên xwe ji ser xetê berdidin û tên dawetê, tên li ber Xidir direqisin.
(Şikrî dengbêj û tembûrvanê topa gundên Omeriyan jorî û ji jêr ve jî ên newala Stilîlê û Qurdîsê bû. »Sed û sîh« gund bûn. Li hemûyan nav dabû, dawet û dîlan bêyî wî nedibûn. Lê heçê Xidir bû, hîna dengbêjekî

nûhatî bû, hîna tu nav û dengê salan pê neketibûn, cara pêşî di daweteke wilo mezin de lê dixist. Wî çaxî xelk dibînin bê Xidir çi yeman e, çi tembûrvan e. Êdî ew jî nav û deng dide. »Mirov li ber tembûra Xidir wek

pelên bi daran ve dilerizin... ên ko di emrê xwe de neketine tu dawetan û
qet nereqisîne jî, gava Xidir lê dixe, xwe di cîhê xwe de nagirin... hima radibin û direqisin« tê gotin.
Wî çaxî êdî Xidir, Şikrî derbas dike. Erê Xidir wî derbas dike, lê hostatiya lêxistina tembûre, dîsa ji Şikrî re dimîne. Omerî wilo li hev dikin. Ji wê encama darezaniya xwe tu caran daneketin: »Bavo Xidir, Şikrî derbas kir, pir xweş lê dixe, dawetan pir xweş digerîne û êdî ew serekdengbêjê me
ye... ket dewsa Ûsivê Çelebî. Lê Şikrî jî piştî Ûsivê Çelebî mamostê hemû tembûrvan û dengbêjên me ye.« Nav û dengê Xidir wilo belav dibe... ji nav Omeriyan derdikeve û ji Diyarbekirê bigirin, heta bi Bêrûdê, Dêrazorê û Mûsilê diçe.)
Daweteke nedîtî bû. Şeş rojan lê dixin. Roja heftan jî, êdî dor tê anîna Gulçînê. Sibehê, gava roj şêrîn dibe, îcar Tahirê Ûsivê Mûsik xwe ji çûnê re kar dike. Şînbozê xwe yê fal li malê dihêle û mehîna Çavqeliştî dibe. Navting û bertinga wê jê re baş dişidînin, qaîşên nêr û mê li devê wê dixin, tejikekî rengîn û bi gulik û rêşîk pê dadikin, nivişt û çavşînkan bi eniya wê vedikin, stûyê wê tije morîkên şîn dikin û rişmên wê didin destê wî. Tahirê Ûsiv, Şikrî ji daweta li malê re dihêle û Xidir bi xwe re dibe. Dor sed û pêncî-dused kesan didin dû Tahirê Ûsiv. Yek liban qîz û xort li Talatê dimînin. Ên din hemû dibin xêlî û pê re diçin.
Rojeke xweş e, ew jî wek qîzeke xêlî dilgeş e û dikene. Tê gotin ko bi hukmê xwedê wê rojê li hêla botan girgira tavê erd û ezman dihejand lê li
nav omeriyan rojê serê çûkan dişewitand. Ew jî wilo dibe xelî û diçe Gulçînê
Piştî sikaka rezan, êdî heta Hebîsê, rê di best û newal û xiram û pana-

van re ye. Du alî dar û deviyên tarî ne, tahtên bilind in û xewle ne. Gava li panava pêşî diqulpin, Xidir, dor deh gavekî bi dû mehînê de, di nav jin-biyan û ên bi mêr de dimîne û lê êdî qîz û xort hêdî hêdî xwe vedidizin û diavêjin pişt taht û deviyan. Bi dû re radibin û dîsa digihijin xêliyan. Carnan cot cot, ref ref ji paş ve, ji ber taht û deviyan radibin û bi lez tên dikevin nav xêliyan. Gava Xidir dev û lêv û hinarkên qîzan ji ramûsanan wilo sor û ji gezan gezkirî dibîne, ava du aşan bi devê wî dikeve. Lê dinere û dibîne ko tu tiştek pê nabe. Serê bennê xortaniya nûhatî ji destên wî fil-itiye. Wî çaxî klama Nofa ji xwe û qertejinan re dibêje.

61

SORÊ GULÊ

Tahirê Ûsiv li ser pişta mehînê çend carekî li xwe difitile û dibîne ko xêlî kêm dibin. Dibîne ko heçê xort in, di nav xêliyan de xuya nakin. Tê derdixe bê rewş ji ber çi ye. Li Sofî Dimdim û Çavqeliştî difitile û »wele-hî heger qîz û xortên me îro tu qebhetan nekin û tu belan neynin serê me û xwe, baş e« dibêje.

Sofî Dimdim »rast e apê Tahir, qîz û xortên vî heyamî pir bêedeb in... ne şerm dikin û ne jî ji xwedê ditirsin« dibêje, lê Çavqeliştî, »xem nake apê Tahir... îro dawet e, adet e, bila ji xwe re bi hevdu bilîzin« dibêje û rêya xwe dom dikin.

Li ba Hebîsê, li ser kaniya Şêx Hiseyn li bendî qîz û xortên jêmayî dimînin. Cot cot tên û dikevin nav xêliyan. Ji wir pê ve, êdî bi hevdu re dimeşin. Qonaxa bi dû re Kurikê ye.

Xidir li binya Kurikê dest pê dike û dîlanê li hewşa mala bavê bûkê germ dike. Dengê lîlandinan li newalê li hevdu vedigerin. Dawet mezin dibe û difitile. Xortên Kurikiyan jî xwe nagirin û ji ser xaniyan dadikevin reqsê.

Piştî du saetan, gava têr direqisin û Gulçînê kar dikin, Reşo, biçûkê biran dikeve devê derî û »bi xwedê heta hûn xencereke zîv nedin min, ez nahêlim nigê Gulçînê ji vê malê derkeve« dibêje.
Tahirê Ûsiv bi tedarik e... xencerek di ber de ye... wî zû qane dike, bûka xwe ji hewşê derdixe. Lê îcar Hiseynê bekçî bi tiving û kincên cendirman li serê kuçê derdikeve pêşiya wan û »welehî heta hûn xelata çawîşê cendirman û midîrê nehiyê nedin, ez we bernadim« dibêje. Tahirê Ûsiv »ma xelata wan çi ye« dibêje, Hiseynê, »du kar in... her yekî ji wan karek e... karek bi pêncî lîran e« dibêje. Tahirê Ûsiv destê xwe dixe paşila xwe, peran derdixe û »welehî wê rojekê hin xwîna te di stûyê xwe xin, lê îcar ka bê kîjan rojê ye. De ka binere bê yekî din wek te li nav Omeriyan heye« dibêje. Hiseynê aciz dibe û »welehî ez karim te bigirim û bibim qerekolê, lê ez dîsa di te dibuhurim... cezê te û wê gotinê, tu dê dîkekî jî bidî min... yan na ez we bernadim« dibêje.
Talatî xwe lê radikişînin, lê Esedê Xudo bi dengê wan derdikeve ser xaniyê ko ji qesra bilind re bûbû dik û ji ser wir rewşê dibîne. Gazî Hiseynê dike û »wan berde Hiseynê, ez ê dîkekî bidim te« dibêje. »Soza ko tu dê îro bidî min, bide« dibêje, »erê, erê soz« Esed dibêje. Hiseynê wî çaxî xwe ji rêya wan dide alî.
Tahir rişmên mehînê dikişîne û »lêxe Xidir... heta em ji nav gund derkevin, bila qîz û xort koçekiyê bikin« dibêje.
62 SORÊ GULÊ

Xidir derdikeve pêşiya mehînê û lê dixe, naşî û jinbî jî derdikevin pêşiya wî bi xwe û dismalan dihejînin, li hevdu vedigerin, xwe li erdê dixin û radibin û diçin. Heta ko di qesra Hiseynê derbas dibin, wilo direqisin. Li ser çemê ko ji Hebîsê tê, bi dorê û bi rêzê xwe di ser keviran re diqevêzin û derbas dibin.

Çend qîz û xort hevdu li kêleka rê, li aliyê Kurikê digirin û direqisin. Hin ên din li aliyê din hevdu digirin û dawetê germ dikin. Xêlî di wan dibuhurin, ew hevdu berdidin, bi lezê digihijin wan, dibezin pêşiya wan, hevdu li wir dîsa digirin, direqisin, heta xêli di wan derbas dibin, hevdu dîsa berdidin û digihijin wan. Dengê Xidir û halên xortan û lîlandinên jinbiyan di newalê de li hevdu vedigerin. Heta wê rojê tu bûk bi wê eza-metê û wê kêfê ji Kurikê neçûbûn. Lê tu nabê heta wilo, xortên Kurikiyan li wan difitilin û rê digirin.

Li ba cok û tûya Himada, yek yek, dudu dudu ji pişt taht û deviyan derdikevin. Xêlî dicefilin û radiwestin. Lê xortên Talatiyan qoçanîkên xwe ji pişta xwe vedikin, li keviran daqûl tên û derdikevin pêş. Qîz xwe didin pişt wan û nav di wan didin.

Tavilê Qaso, mezinê xortên Kurikiyan derdikeve ser tahtekê û »Talatîno, ma qey ketiye serê we ko hûn bikaribin bêyî ko karê xortan bidin, qîzekê ji nav me derbixin û bibin. Bi xwedê hevalên min hemû karkirî ne, hemû bi qoçanîk û qewsik in. Cindiyê Tûjan bi wê qewsika xwe li çavê kew dixe, derziyê difirîne. Ji Gulçînê bipirsin, ew baş dizane bê Cindî çi tov nîşançî ye. Min ew şîret kiriye. Wezîfa wî, şikandina serê bavê zavê, ê bûkê û ê Xidir û tembûra wî ye. De îcar bê xwîn û bê pevçûn karê me bidin me û rê a we ye« dibêje.

Gulçînê li ser pişta mehînê dilerize. Dizane ko Qaso rast dibêje, kevirên Cindî vala naçin. Heger bi xweşî li hev nekin, wê serê wê bibe delav. Lê dizane ko ji bêdengiyê pê ve tu tiştekî din di destê wê de tune ye. Lê Xidir, »ma a min çi ye lawo... çima serê min û tembûra min« dibêje. Qaso, »tu tembûrvanê wan î, ji bo ko dawet nema bibe« dibêje.

Wê bîstikê kevirekî qoçanikan ji hêla xortên Kurikiyan di ser serê xêliyan re difire. Awirên topa wan didin dû vingîna kevir. Bi bayê xezebê diçe û li nîvê kevirekî benna bexçan dikeve. Çirûskên êgir jê diçin û

dengê tivingekê jê tê. Qudûm li Gulçînê û xêliyan dişikin. Û bi ser de, »aha kevirên me wilo ne« Qaso dibêje û wan hîn bêtir ditirsîne.
Tahirê Ûsiv diheyire. Destûra wê adetê bide, nede! Bila ew rîtuala çaxê birina bûkan wek ko bi sedsalan bûye, bibe, yan na!

63

SORÊ GULÊ

Lê xortên Talatiyan, natirsin, qoçanikan badidin û xwe ji pevçûnê re kar dikin. Xalit li malê mabû, lê Etman li tenişta Incik e. Incik li ser navê Talatiyan derdikeve pêş û »ma ew ji ber ên me ve çi ye... ên me çapilî ne...
zû ji pêşiya me rabin... welehî bîst û yek qoçanîkên me hene... me hemû ji bo îro nû hûnane. Destik dirêj in, kefik fireh in û bi guhik in... em dikarin kevirên nîvweqî bi wan biavêjin. Min hemû yek bi yek ceriban-dine. Zû ji wir rabin. Ez Incik im, ez gurê piştşîn im, pirçkinik im. Min bi qoçanîkê xwe, tiving ji kozikan rakirine. Îcar bîstên din jî wek min hene. Pênc qewsikên me jî hene. Ah ev pismamê min, Ezê Mûsikiyan li mû dixe, derzî bi qîzên gundê me ve nehiştine. Hemû jê re bûne nîşan, wî jî hemû firandine. Min heta niha deh bûk birine û min karek tenê jî nedaye. Bi xwedê em nahêlin ko hûn serê xwe ji pişt taht û deviyan der-bixin û kevirekî tenê biavêjin me. Heger hûn tev bilivin, em ê we ser bixwîn bi ser dêyên we de bişînin malê« dibêjê.
Tahirê Ûsiv dinere ko rewş xeter e, wê xort hevdu perçe bikin, wê bûk û pîrek di nav nigan de herin. Wê şerîtên xwînê ji serê wî û Xidir û bûkê biherikin. Wê li dinyê û axretê bihetikin. Hema zû dengê xwe li xortên xwe dike û ji ên din dipirsê bê ma heqê karê wan çi qase ye. »Pêncî lîre ye,
kar hemû bi pêncî lîran in... adeta gundê me wilo ye« dibêjin. Tahirê

Ûsiv pêncî lîran ji wan re dişîne, wan ji rêya xêliyan radike û bûka xwe çav zuwa derbas dike.
Lê Incik pir li ber xwe dikeve, »çawa ez serek qoçanîkçiyê Talatiyan, ez sax û nemirî û ez bi xêliyan re bim, hin bên me bitirsînin û karan ji me bistinin« dibêje û diingire. Qîz û xort û Tahirê Ûsiv bi xwe, bi qurban û heyran li ber dilê wî diçin û tên heta ko wî aş dikin. Dixwest nema bi xêliyan re bimeşe. Dixwest bi tenê ji xortên Kurîkiyan re li wir bimîne û kêr bi paş de bistîne. Lê xêlî wî bi xwe re dibin û diçin.
Li Hebîsê, li ber Kaniya Şêx Hiseyn, Çavqeliştî »apê Tahir, êdî heta Talatê av û kanî tune ne, ka bila xêlî avê vexwin, bêhna xwe vekin û ji nû ve bidin rê« dibêje. Tahirê Ûsiv bi a wî dike û mehînê ber bi kaniyê ve dikişîne.
Naşiyên Hebîsiyan li wir in û Hiseynê birê Xidir jî di nav wan de ye. Xidir berê xwe dide wan û »lawo Hiseyn, bayê sor pê keto, ma tu îro kezîzerên Talatiyan nabînî. Yekê bi tiliyan şanî min bike, em ê ji te re bînin« bi dengekî bilind dibêje.
Hiseyn »na, min Xanimka apê xwe divê« dibêje, lê xortên Talatiyan xwe li Xidir xwar dikin û »ma em mirî ne ko tu bê qîzan ji nav me bibî ji

birê xwe re« dibêjin. Xidir, »ez henekan dikim lawo, ka bisekinin... bila hemû ji we re bin... hûn Talatî tivingçî ne û bitir in... kî dikare di ber we re bajo« dibêje. Berê xwe dide Hiseyn û »ji Mencola min re bibêj Xidir sibe tê, bila çavên wê li zarokan be« dibêje.
Xêlî didin rê. Sofî Dimdim rişmên mehînê digire. Xidir dor deh gavekî bi dû bûkê de li tenişta Çavqeliştî dimeşe. Jinbî li paş dimînin. Xidir jî xwe dide paş û dikeve nav wan. Naşî li paştir in, bi dû hevdu dikevin, hevdu ji ser rê didehfînin û tên.

Du xortên Meskeniyan du qîzan li kolana xwe dikin. Xidir li wan dizîvire û »ma ez neyêm alî we lawo Meskenîno« dibêje. Meskenî pê dikenin û »na« dibêjin. Incik jî radihije sozdara xwe. Hinên din jî çav li wan dikevin. Êdî Xidir, deh qîzan li ser kolana xortan dibîne, didexise. »Lawo ma tu ên ko li erdê mabin, tunene...« dibêje. Gava ew »na, na« dibêjin, »wê bi ser stûyên we de mîz bikin lawo, wan deynin« dibêje. Tahirê Ûsiv dengê xwe li xortan dike û dixwaze ko xwe di edebê de ra-girin. Gazî Xidir dike. Daxwaz dike ko navê çiya û newalên Hebîsê jê re bibêje.

Xidir li çiyan dinere. Kulîlkên beîvên mala Nûrkê li jêra çiyê dibîne. Bêhna zayîna buharê dide bêvila wî. Dêngê kewan ji çar aliyan tê. Bi dil-bijîn »tu dibînî apê Tahir bê hîn çiqase kew li ba me hene« dibêje.

»Erê Xidir, çiyayên we asê ne, bi dar û ber û devî ne, kew tê de pir in« dibêje.

»Apê Tahir, bi meznaya xwedê ew ê ko li jora şkefta Hepsê dixwîne, mêkewa xwe dixe ser hêlinê« dibêje û navê çiya û newalên Hebîsê jê re di-

hejmêre.

Li durêyana Talatê û Cibilgirawê, şivanê Talatiyan bi lez tê ba Tahirê Ûsiv û »niha şeş zilamên bi tiving di serê wê sirtê re derbas bûn« dibêje.

»Ma suwarî bûn ya peya bûn« Tahirê Ûsiv dipirse.

Şivan, »peya bûn apo û tu heywan bi wan re tune bûn« dibêje.

»Madem peya û sobe bûn, xem nake birazî« dibêje û li Xidir difitile: »xortên me ne. Min êvarê ew xewle kirin û heta em herin û bên, hûn jî di çiyan re paşmêriya me bikin... çi dibe û çi nabe... em xwedî dijmin in«.

Reşît û pênc pismam bûn. Ji dûr ve paşmêrî dikirin. Heta ko xêlî bûkê ji Kurikê derdixin, ew li serê xiramê pişta coka Himada rûdinin, mewî-jan dixwin, çixaran vedixwin û li dora gund dinerin. Dibînin ko xortên

Kurikiyan li pêşiya xêliyan difitilin, lê »bila karê xwe bistînin, adet e« dibêjin.

65

SORÊ GULÊ

Heta xêlî vedigerin, Şikrî dawetê li hewşa mala Tahirê Ûsiv digerîne. Êdî esir e, sî dageriyaye newalan. Talatî di xiroşa çaxê hatina bûkê de ne. Tavilê xêlî li serê sikaka rezan xuya dikin. Xidir li wir derdikeve pêşiya xêliyan û lê dixe. Gava ji gund dengê wî dikin û wan dibînin, bûkên mala Mûsik lotikan didin, dilîlînin û pêrgî wan ve diçin binya malan. Refek pîrekên mala Mûsik ji nav xêliyan derdikevin pişt Xidir, lotikan didin û koçekiyê dikin. Xort dikevin nav wan û xweştir dikin. Dengê halan û lî-landinan li wir jî bilind dikin. Xidir dibêje, lê dixe û wan wilo dibe heta binya malan û tev li ên li gund dike. Li wir, êdî »xanimê lê xanimê, bûka mala bavê min ê« dibêje û wan dikişîne hewşê.
Wî çaxî Xidir, Ûsivo li ser qorziya qesrê dibîne. Tê gotin ko serqusandî, rîhkurkirî û simbêlhinekiri bû... diçirisand... wek berûya ko nû ji kovikê derkeve bû. Xidir klamê li gor dilê wî diguhere û dengê xwe bi ser ê Şikrî dixe: »esmer e, çavbelek e, de werin werin... esmer ji gewran çêtir in, de werin werin... esmerê bi gewran nadim, de werin dîlana esmerê« dibêje. Ûsivo li ser qesrê bi ser hev de dihile, difûre, xwe nagire, li pismaman difitilê û »ez ê îro toba xwe ji bo xatirê belekên çavên Gulçînê xera bikim... tu ka pismam wê tivingê bide min« ji Mûsê Mûsik re dibêje û qirikdirêja çapilî eskerkî radigire û pakêtekê li ser hêtûna Cibilgirawiyan dike. Deng li hevdu vedigere û xuşîn bi best û xiraman dikeve. Xidir, »yeke din Ûsiv gidî... yeke din çavê mino... bûk lê hêja ye... dengê tiv-ingên we Talatiyan wek qirçîna şkestina hestiyan in, xweş li dawetan tên« dibêje. Ûsivo bi a wî dike... toz û dûman ji hêtûnê radibe.

Reşît, »ew dengê tivinga mala apê min ê« dibêje û ew û pismam ji serê sikaka rezan li ber hêtûnê rûdinin û tev li kêfê dibin. Şeş pismam bi hev-du re lê girêdidin. Her yekî ji wan pakêtekê lê vala dike. Hêtûn hildiweşe; toz û dûmaneke sipî wek rengê xezebê jê radibe û bi ezmên dikeve. Ên ko

meselê nizanin, bi awirên tirs û pirsê li hevdu dinerin û dicefilin. Gelo kî ne ko hatine serê sikakên gund û wilo tivingan berdidin! Tahirê Ûsiv rewşê dibîne û dike ko cebar bike û »xortên me ne gelî Omeriyan, dîlana me berdewam e« dibêje. (Bi dû re tê bihîstin ko Cibilgirawî, wê yekê bi xwe gelekî nexweş dikin. Hêtûn payîzê şewitandibûn, gerek çile hilweşiyaba, hêdî hêdî sar bûba û dê buharê bikêr bihata. Lê hilneweşiyabû û bûbû mijara henekên Talatiyan. Û îcar ji tivingên wan re bûbû nîşan jî. Cibilgirawî, »çima kirî Talatî tivingan berdin hêtûna me« dibêjin, bi hevdu dişêwirin û xwe ji şer û heyfê re kar dikin. Li gor ko tê gotin, Zibêrê mala axê wê êvarê li wir e, wan radigire û ji bo sulhê,

qasidekî dişînê du axê Omeriyan. Axe roja din zû tê, dikeve nav wan û hîna berî ko roj bibe êvar, xeterê diferikîne. Talatî ji ber wê kirina wan, bi beranekî sêbirînî tên curmkirin. Ji bo xatirê cîrantiyê û axê, xwe bi kêfxweşî didin ber curmê. Roja bîst û yekê adarê, berên dikin firavîn û axe û maqûlên herdu gundan, li nav rezê mala Temo -maqûlekî Cibilgirawê- bi hev re dixwin û li hev tên) Gava Tahirê Ûsiv wilo dibêje, cotên bûkên mala Mûsik bi qesran ve hildikişin û ji wan re dilîlînin. Xweşmêrên mala Mûsik, ji hewşê, berê çar tivingên din di ser serê ke-vokên xwe re didin ezmên û xûşînê bi best û newalan dixin. Lîlandin û tiving ji hevdu zêde dibin û digerin. Şahî bi ser gund tevî de, wek taveke buharê dibare. Gulçînê, him ditirse û him jî serbilind dibe. Lê dîsa jî, piştî

ko sê bizinan wek xelat distîne, ji nû ve ji mehînê dadikeve û şerbikekî heta dev tije şekir û pere ji zarokan re li erdê dixe. Ûsivo jî sê caran çenga xwe di bêrîka şalê xwe dadike û peran di ser serê wê re li nav zarokan di-reşîne.
Êdî Şikrî û Xidir herdu bi hevdu re lê dixin. Geh di ber hevdu re diçin û tên, geh jî pêrgî hevdu diçin û dibêjin. Xalit û Wesîla dotmama xwe di serê dawetê de milan didin hev. Mûsê birê wê, Siltana xuşka Xalit digire. Dizanin ko êdî dora wan e. Hevdu dikilin. Dilê xelkê dibije wan û wek wan dikin. Dawet mezin dibe, xurt dibe, germ dibe, dikişe û difitile. Qîz dikevin destê xortên gundê xwe û wan sor û germ dikin. Xort di destên wan de dîn dibin, qîz bi wan re mest dibin.
Tava hîvê ye. Şev wek rojê ye. Dawet germ e û dil geş in. Piştî eşayê dawet ji nû ve belav dibe. Gundiyên mêvan wê şevê didin tenişta hevdu û diçin gundên xwe. Daweta mala Mûsik deng dide, heft salan tê pesinandin. Dû re a Xalit û Wesîla û a Mûsa û Siltanê jî çêdibe, lê tu dawet nabe wek a Ûsivo û Gulçînê.
Dibêjin ko gava Ûsivo xavika ser rûyê wê radike, »qîzê min soza xwe anî cîh... min soz û qerar dabû, heger ko bi xweşî nebûya, min ê bi darê kotekê bikira... min pênc tiving kar kiribûn... lê va ye bi xweşî bû... êdî tu jin be û çê be« dibêje û eniya wê maçî dike.
Gulçînê bi şermokiya bûkan dibeşişe û »xorto welehî tu dîn î, lê rast e, tu dînê min î. Lê ma ne te sozin din jî dabûn min... hin jê, divê seranserê emrê dirêj bin. Ez ê jin bim, ez ê ji mala te re stûn û senede bim, ez ê di a te de bim, lê divê tu jî li min nexî« dibêje.
Ûsivo, »bi soza xwedê Gula min, ez ê destê xwe li te hilnedim« dibêje.
Ên ko li ba wan in û wê axavtina wan dibihîzin, dibêjin »gelo ev dîn

bûne, çi ji hevdu re dibêjin«. Bi çîroka dilketina wan nizanin, ji tu kesan re negotibûn. Piştî guhêztinê, ji nû ve çîroka dilketina xwe ji xelkê re dibêjin. Îcar dikeve nav xelkê û digere. »Eşkere ye ko qeder e, nivîsandina xwedê ye. Ji ber wê yekê wek du stêrikên li ezmanan geriyan û li hevdu rast hatin« tê gotin.

Dilketina wan wilo çû serî û zû gihan miradê xwe. Wê salê, rêsî bi hevdu re kirin. Wê salê, ne rêsî tenê, lê hemû tişt bi hevdu re kirin. Wî cot kir, wê jî taştê bir serê sedê. Wî bizin girtin, wê jî dotin. Wî navkil û lewlebên şahîk, ji bo ko destên wê neêşînin çêkirin, wê jî meşk bi sêpiyan vekirin û dew kila. Wî navrojan serê xwe danî ser kaba wê û raza, wê jî baweşînk lê kir û têr lê nerî. Êvaran jî, wî çû pişt û zend dan ber deriyan, wê jî cîh danîn. Payîz wilo hat. Perên berê havîna dewlemend ketin destê wan. Wî çû hîzarê balîf û nazbalîfan ji dikanên bajaran kirî, wê jî neqişand. Wî kiras û kil û kildan kirîn, wê jî li bejin û bala xwe kirin û çavên belek jê re kil dan. Wî çi kir, wê jî ser temam kir. Çaxê du sal ji wê xweşiyê çûn, îcar jê re Serdar anî. Xweşî, bû bi ber û fêkî.

Lê ew jî demek bû, buhar û ciwanî bû, bûkanî û zavetî bû. Jîn wek buharê geş û dîn bû lê gelekî zû çû. Rast e, hezkirina wan qet sar û sist nebû, li soz û qerarên xwe nequliptin û bi hevdu re bûn dê û bavê koma zarokan, lê di ber her babet xweşiyan re, dest bi kişandina jana jînê û xaîn-
tiya feleka xopan jî kirin.

Wî wextî bi xwe bû, çaxê ko Tahirê Ûsiv miribû. Çar bira li dewsa wî mabûn. Mal li hevdu par vekiribûn û mabûn ji xwe re. Lê par hindik bû, hêvî xeter xuya bû. Ji ber wê yekê, êdî rêya Nisêbînê derketibû ber wan bi
xwe. Piştî hatina Nisêbînê bi sê salan Esedê Şakir jî emir dabû.

Dibêjin ko êş û qiriktahlî hemû bi dû hevdu de tên. Xuya ye rast e. Barkirin û mirin du tiştên herî tahl û giran in. Herdu jî hatin serê wan. Gundê bav û kalan berdan û çûn Nisêbîna xopan.
Xaniyê wan hebû, lê her du-sê salên pêşî, birçî, şerpeze û rût bûn. Ji ber wê yekê, Ûsivo wan çend salên pêşî, çi kar diketin ber, dikirin. Demekê barkêşiya qaçaxçiyan jî kiribû û bala xwe dabû ser wî karî. Erdek jî li Qamîşlokê kirîbû. Dixwest mala xwe bibe wir û hêdî hêdî bibe xwedî mal û dikan. Lê qelenê heta bi wir buha bû û qet ne bi dilê Gulçînê bû. Û êdî navê wî jî wek qaçaxçî ketibû defterên polîsên binxetê. Nema karîbûn mala xwe bibin wir. Heger li wan deran bihata girtin, wê di binê hepsan de biriziya. Êdî wî bi xwe jî tê derxistibû ko nabe û xebera wê ye. Ew yek û kuştin, du xeterên mezin bûn, lê çareyeke din jî tune bû.
68 SORÊ GULÊ

Gulçînê tu îfade qebûl nedikirin. Her rojê xelk li ser wan rêyan dihatin kuştin. Rojê laşek û dudu ji nav maînan derdixistin. Dihat ber çavên wê ko wê Ûsivo jî rojekê li ser wan têlan bê kuştin û laşê wî bi ser de bînin. Wî çaxî xwîna bedena wê tevî êrîşî ser mejiyê wê dikir û dîn dibû. Ûsivo nikarîbû bihata kuştin, jîn bêyî wî nedibû. Ji ber wê yekê jî, çi cara ko xwe kar dikir û diçû, xwe diavêt pêrxêlên wî û »tu dê bê kuştin... welehî tu dê rojekê bê kuştin... ma tu dê min û zarokan ji kê re bihêlî Ûsiv... ez ê tenê li vê xeribiyê çi bikim... ez ê bêyî te li vê dinyê çawa bikim... welehî ez ê herim ser pira Eleman û xwe tê werkim... bes here... welehî heger tu careke din herî ser wan têlan, ez ê herim mala bavê xwe û ez nema têm« jê re gotibû.
Carekê, du caran, sê caran... êdî gotin ketibû serê wî û ji bo abora zarokên xwe bala xwe dabû ser karekî din. Gulçînê, ew wilo, bi zora girî û hêsiran ji wî karî bi dûr xistibû. Erdê xwe jî li wir hiştibû. Dû re çend

carekî xwestibû here û bifiroşe, lê li hevdu rast nehatibû. Wir bi carekê re
ji bala xwe avêtibû.
Êdî havînan diçû nav tirkan, aliyê bajarê Edenê, li ser avaniyan kar dikir û serê çile jî dihat nav zarokên xwe. Çile pê de jî geh çayêcîtî dikir, geh jî li sûka bajêr pîvazterk, bexdenûs, lehane û gêzer difirotin û abora zarokan dikir.
Çûna nav tirkan ne tu kar bû. Xwestibûn wilo jî nekin. Ceribandibûn, havînekê neçûbû, lê sê rojan kar kiribû, deh rojan betal mabû. Asoxî ew yek qebûl kiribûn. Ûsivo, carê, »ma em çawa bikin Gula min, çare tune ye. Ez û tu, em bi hevdu re gihan binê tama jînê... xweşiyeke ko min bi te re nedît, nema. Min jî rojekê destê xwe li te hilneda û gotineke ji şekir tahltir ji te re negot. Vaye te zarok jî dane min. Êdî ez û tu man ji zarokan re. Ez ê herim bixebitim, tu jî wan li malê mezin bik« digot.
Gulçînê, »Ûsiv ez li te ne poşman im... heger ez dîsa bêm dinyê, ez ê dîsa te bikim... xebera te ye, bila wilo be, wilo çêtir e... hima ez bizanibim ko tu sax î û tu dê dîsa li min vegerî, xem nake« digot û wilo li hevdu dikirin.
Ûsivê Mûsik bi bejina xwe orte bû û dagirtî bû, lê saxlem û zinde bû. Zilamekî mûzer û lihevhatî bû. Rast û merd û camêr bû. Nerm û cirxweş bû. Şîrhelal û bi nan û xwê bû. Karkir di ser wî re tune bû. Çavên wî ji tu karan neditirsiyan, çi kar diketin ber, dikir. Bi wî awayî, tu caran nedihişt ko çavên zarokên wî li xelkê bin û xwe kêmî xelkê bibînin. Çavfireh bû. Gulçînê jî wilo fêr kiribû. Pir ji zarokên xwe hez dikir. Ew di ser hemû tiş-

tan re bûn. Ji xwe Serdar rohniya herdu çavên wî bû. Kincên bedew lê

dikirin, solên spehî dikirin nigên wî û ew berdida nav xortên xelkê. Û nedihişt ko zarokên wî di karên xelkê de bixebitin. Hew Serdar wan her-du salên dawî, havînan bi armanca »şiyarkirina karkeran« diçû tevrikê û hew.
Ji serê deh dozdeh salan ve karê Ûsivê Mûsik ew bû. Serê buharê diçû Edenê û payîzê vedigeriya malê.
Serê pêşî xelkê paşgotiniya wî dikir, bêbextî dikirin stûyê wî: »Ûsivo li wan bajaran yeke tirk ji xwe re aniye, ji ber wilo nayê mala xwe« digotin. Ev gotin, li Kurikê jî digeriyan. Li ser tenûr û kaniyan, »yadê zarokên wî jî ji a tirk çêbûne... ên ko bi çavên xwe dîne hene. Jinik hinekî pîr e, lê pir dewlemend e; xwediya qesir û qusûrên bilind û bexçên sêv û pirtiqalan ê mezin e« ji hevdu re digotin. Ew deng diçûn û diketin guhên Gulçînê. Bawer nedikir, lê dîsa jî şikeke xaîn ketibû dilê wê û jê dixwar. Sala pêşî, xwe girtibû. Lê a din, hîna gava nû Ûsivo hatibû malê, xwe negirtibû û ew yek li ber guhê wî xistibû. Ûsivo pêşî hinekî bi aqilê wê keniyabû, lê dû re gava dîtibû ko ji dil dibêje, bi dilovanî baweriya wê anîbû ko tiştên ko tên gotin, bêbextî ne, derew in. Tenê ji bo aboriya zarokan li deriyan e. Jê re, »tu jî dizanî ko çûn bi min jî ne xweş e, lê de ka rêyeke din bi ber min xîne, ez naçim« gotibû. Lê dû re, xelkê ev yek terikandibû.
Ûsivo, carê hew çar pênc mehan tenê li malê dima. Hema ko zivistan diçû û dinya hinekî germ dibû, ew berî hemû kesan diçû Edenê. Heta ko serme dihat û karê avaniyan bêxêr dibû, ew ji nû ve dihat malê.
Wê buharê dîsa wilo kiribû. Dema nû qeşa heliyabû, serme rabûbû, bayê kur rawestiyabû, dîsa wextê wî hatibû. Dawiya sibatê karê xwe yê çûna Edenê kiribû. Lê Gulçînê »ez ê sibe ji te re kutilkan çêbikim û dusibe şamborekan...« piştî du rojan jî, îcar, »Ûsiv te şîveke epraxan bixwara... te yeke goşt û birincê jî bixwara...« Çaxê ew roj diçûn »te yeke roviyên heşandî jî bixwara û tu dû re biçûya« gotibû. Ew bi wî awayî çend

rojan dereng xistibû. Xwestibû wî bi hemû şîvên ko dihatin bîra wê bertîl bike û bihêle. Asoxî li hevdu kiribûn û dawî li şîvan anîbûn. Serê adarê çûbû.
Lê felek xaîn bû, kamaxê çiyayê Gawirda€î derbas nekiribû. Otobusa wan li wir quliptibû. Nêvî ji rêwiyan bîstika pêşî di cîh de miribûn, hin jî bi dû re miribûn. Ew jî yek ji miriyan bû. Roja piştî çûna wî xebera di wê derheqê de ji radioyê bihîstibûn. Lê hîna nizanîbûn bê otobusa wan e, an na. Lê zû derketibû ko ew otobus bi xwe ye.
70 SORÊ GULÊ

Li vê tofanê! Ûsivo çawa dimire! Wê Gulçînê piştî wî çi bikira! Li xwe dixist û wilo ji xwe dipirsî.
Gulçînê dîn bûbû û dikira bi çiyan bikeve. Tiştekî weha qebûl nedikir. Çavên wê di nava serê wê de pahn dibûn û li ber girî diçû.
Gulçînê, hîna berî ko bizanibe bê Ûsivo di çi rewşê de ye dest bi girî û hewarê kiribû. Wê bi xwe, zanîbû bê rastiya xeberê ji bo wê çi tofan û talanî bû. Zarokên wê li dora wê kom dibûn, bi kirasê wê digirtin û pê re digiriyan, mala wê dikirin wek mala sêwiyan. Serdar bi nav kul û xeman de kûr daketibû. Xemgîniya dinyê hemû rijiyabû ser rûyê wî û mabû li ber radioyê. Radioyê, carê »ên mirî hemû hîna nehatine naskirin« digot. Pêşî gava nav dixwendin, bavê wî ne di nav wan de bû. Kesereke kûr vedida û dima heta careke din. Gulçînê jî carê dihat û guhê xwe dida ber radioyê û guhdarî dikir. Lê tiştek fam nedikir, wê bi tirkî nizanîbû. Heger navê mêrê wê bihata xwendin, wê tê derxista ko qala mêrê wê dike. Her cara ko navê miriyan dixwendin û navê wî nedigotin, dilê wê piçekî rehet dibû, lê tirs û şîna ko ketibû dilê wê, dernediket. Tirsa malikşewitî dîsa giran dibû, tûj dibû û ew dişewitand. Serdar didît, carê serê wê datanî ser sênga xwe û alî wê hinekî bêdeng digiriya û dû re jî serê wê radikir, qewe-

ta xwe li xwe dicivand û çend gotin bi ser hevdu vedikirin. Dikir ko hêviya di dilê xwe û wê de bilindtir û qewîntir bike. Lê... lê dîsa jî nedibû. Roj gihabû ber nîro. Radîoyê dîsa got. Gulçînê bi xemgînî pirsî: »ma îcar çi got kurê min?«
»Dibêjin ko şifêr nezan bû û bi ser nezaniya xwe de, araq jî ziqimîbû. Îcar li ber xelaseka çiyayê Gawirdagî, otobus xurt ajotiye çiveke teng û ji rê derxistiye. Nêzîkî sed metroyan di ser hev re quliptiye û çûye.«
»Mala min şewitî... ma ko sed metroyan di ser hev re quliptibe, kî sax maye kurê min« got û giriya.
»Hemû nemirine mama... gelek jê bi birîndarî xelas bûne. Hin rakirine Edenê û hin jî li Osmaniyê ne. Navê ên mirî xwendin, bavê min ne di nav wan de bû. Ka hinekî bêhna xwe fireh bike, belkî bavê min jî hew birîn-dar e, balkî bavê min ne miriye. Ji bo xatirê zarokan bes bigirî... him...« Serdar got û ew maçî kir.
Gulçînê, bi çavên mişt hêsir lê dinerî û dixwest bibêje »ez nikarim kurê min, ne tiştekî di destê min de ye« û giriyê xwe dom kir.
Nîro Şêrîna xuşka wê û zarokên xwe jî ji taxa Kanîkan hatin. Ket derî û »keçê porkurê Gulê ma raste« got. Gava çavên Gulçînê lê ketin, girî lê hişktir û girantir bû, şîn û xemgîniya malikşewitî lê tarîtir bûn û zûrîna

giriyê wê bû wek zûrîna guran. »Ez nizanim xuşkê... tofana ko hatiye serê min, hîna ne rast derketiye û ne jî derew. Lê dilê min porkurê di nav lep-ên mirina xaîn de ye« got û li xwe xist. Şêrînê û zarokan jî dest bi giriyê kamax kirin. Mala wan bû wek kewara mêşan. Piştî ne bi gelekî Çeto jî hat. Cîranan jî rewş fam kirin û hêdî hêdî hatin. Dû re Mecîdê mêrê Şêrînê jî hat. Hundur tijê pîrek û zarok bû, cîh jê re nemabû. Mecîd

qapûtê xwe li xwe pêça û li hewşê li ser kursiyekê rûnişt. Çigare ji hev pêdixistin. Êdî roj dor esir bû. Du camêrên cîran jî hatin li ba wî rûniştin. Temoyê mêrê Têliyê û Selîmê mêrê Xunavê bûn. Sorê lawê Têliyê jî bi dû re hat.
Saet heft û nîvê êvarê, wextê ajansa dirêj bû. Tavilê navê Ûsivo jî avêtin bin wê gotina kereh. Wî çaxî dinya bi ser Serdar û Gulçînê de hilweşiya. Gava nû »Ûsiv Taş« gotin, Serdar serê xwe rakir û li dêya xwe nerî. Nêzîkî wî bû. Xwîn jê çûbû, çavên wê beloq bûbûn, devê wê nîv ji hev mabû û bêhna wê çikiya bû. Wek ko can û xwîn tê de tune bûn lê hatibû. Wilo bêdeng û bêliv û bizdiyayî rawestiyabû. Bi bihîstina navê Ûsivo re, dest bi hejê kiribû. Dişewişî. Tavilê »li min pepûkê, li vê tofanê« got û êdî destên wê hatin bîra wê. Bi lapûşkên herdu destan kir ko rûyê xwe zîvar zîvarî bike. Lapûşk kûr diavêtin. Bi cara pêşî re cîhê her deh neynûkan li rûyê wê xuya kirin. Zozanka biçûk jî ji tirsan re kir qêrîn û xwe avêt dawa wê. Gulçînê, ew nedît û nebihîst. Şêrînê ew girt ber himbêza xwe. Çavên Serdar tijê hêsir bûbûn, lê didît ko dêya wî ji dest xwe diçe. Xwe avêtyê, ew li hewayê girt û serê wê danî ser milê xwe, herdu destên wê girtin û rûyê wê ji destên wê parast. Gulçînê dikir ko aqilê xwe berde û dîn bibe. Bi tu awan nedihat rawestandin û aşkirin. Heta derengê şevê, heta ko ji girî zuwa bû û bêhal ket, giriya.
Serdar û Mecîd, otobusa sibehê girtin û ketin rêya Osmaniyê. Tembiya dêya xwe û zarokan, li Şêrîna xaltîka xwe kir. »Tu qewîn be xaltîkê, û çavên te li wan be« got.
Roja çaran laşê Ûsivo anîn û hatin. Roja ko hatin, gihan wî veşêrin jî. Biçûk û mezinên taxê hemû pê re çûn nav Mezelê Hecacan. Bi gi-ramiyeke nedîtî Ûsivo bi rê kirin. Hemû kes ecêbmayî mabûn. Ma ên ko jê hez dikirin û li ber diketin çi qasî pir bûn.
Ketin bin çengên Gulçînê û ew ji wir anîn. Lê gava nû giha malê, bi

meqes bi porê xwe ket. Heta ko Têliyê û Şêrînê pê ve gihan, wê herdu gulîk di ber binî re jê kirin û wek du rêsiyan avêtin dera han. Êdî dora temberiyê û biskan bû. Şêrînê û Têliyê »keçê Gulê malxerabê tu çi dikî«

gotin û bi destên wê girtin û ew zeft kirin. Lê wê, »min berdin, ma ez ê piştî Ûsivo çi bikim ji wan« got.
Wê kirinê, tesîreke mezin li Serdar kir, êşeke mezin kir dilê wî. Dêya wilo spehî, bûbû wek dînan, wek qirdikan. Bav miribû û ew yek hatibû serê dê. Dilê wî dihiliya û diniqutî nava wî.
Piştî ko şûn rabû, çû ji nav dahla Hemê Cizîrî derxeke tûyan anî û di ber serê bavê xwe de çand. Tembî li Sînemê kir ko her rojê biçe av bide. Dereng bû, lê xwe girt.
Ûsivo li cîhê cîh nemiribû, bi birîndarî rakiribûn heta Osmaniyê. Li gor rapora ko doktor dabû, roja din, ji ber birîna serê xwe çûbû. Xwîn çûbû ser mejiyê wî. Lê bedena wî jî hemû hatibû cûtin.
Çaxê Serdar û Mecîd çûbûn Osmaniyê, birên Ûsivo û xezûranên wî hatibûn û di şûnê de rûniştibûn. Gelek Talatî û Kurikî bi wan re hatibûn. Dû re jî nifşek dihat yek diçû. Lê ap û xal deh rojan man. Xwarina Ûsivo jî dan û dû re çûn.
Heta li wir bûn, xwe dan ber hemû xerciyan. Gava çûn jî, di nav hev de hinek berdestî dan ser hev û xwestin bidin Gulçînê, lê negirt. Dan Serdar, wî jî negirt. Ji bo ko dû re bide Gulçînê, dan Şêrînê.
Piştî ko ew çûn, Gulçînê ji nû ve, eşkeretir di tenêbûna xwe û di mez-inbûna tofana ko bi ser de hatibû, derxist. Ûsivo, ne êş û girî tenê jê re hiştibûn. Tê derdixist ko êdî him dê ye, him bav e, him jî sermiyana malê ye, him jineke bî ye û him jî dêya sêwiyan e. Hemû tişt di stûyê wê de mabûn. Ji nû ve tê derxist ko êdî mal, maleke bê zilam û bê sermiyan e.

Hejmara malbatê a rast ji nû ve derket ber çavên wê. Dinerî û ew dihejmartin, didît ko yek kêm e. Ûsivo kêm bû, stûna nava malê kêm bû. Ê ko ji nav temamê xortên ko di wextê xwe de dîtibûn ji xwe re hilbijartibû, êdî tune bû. Dikir û nedikir, nikarîbû mirina wî qebûl bike. Êşeke mezin bû, kamaxî bû, girî jê re diviyabû. Ew jî digiriya. Heta wî wextî, gihabû ko ji girî zuwa bibe. Di wan deh rojan de nêvî mabû. Rengê wê bûbû wek ê miriyan. Gotin jî ji devê wê dernediketin. Ew û zarok hemû dujîn û perîşan bûbûn. Şêrînê carekê û Meyrema dêya Misto jî carekê serê biçûkan şuştibûn. Tiştê ko Serdar ji halê zarokan tê derdixist, rewş xerab bû. Hemû bûbûn wek çêlîkên pîrebokan. Wî çaxî pê hisiya ko îcar divê ew bi xwe bikaribe wek zilam rêberiya malbatê bike, ji Gulçînê re bibe senede, li zarokan xwedî derkeve, wan ji xeteran û ketinê biparêze. Rastkirina wê rewşê, êdî ji xwe re bar û vatinî didît. Rewş ji dêya xwe re got û tika kir ko hinekî qudûman bide ber xwe. Gulçînê didît ko rast e.

73

SORÊ GULÊ

Rabûn ne hêsan bû, lê bi alîkariya wî, hêdî hêdî destên xwe avêtin zarokan û rabû ser nigan. Hêdî hêdî dest pê kir û pêşî bi zarokên biçûk re, bi dû rê jî bi ên din re axivî. Lê serê saetê libek dudu hêsir ji çavên wê diherikîn ser dev û lêvên wê. Dema diramiya û didît ko Ûsivo bi carekê re ew hiştiye û çûye, xwe nedigirt û digiriya. Êvaran, dema zarok dikirin xewê, ji nû ve rûdinişt û qederekî digiriya.

Heta mehekê jî her şevê û her rojê digiriya, lê dû re giriyê wê firktir û siviktir bû. Êdî çav nedigiriyan, lê dilê wê her bi girî bû, bi kul û xem û birîn bû. Mirina xaîn, êş û şîn û xemgîniyeke mezin bi ser de anîbû. Tam û rengê jîna mala wê, bi carekê re çûbû. Tiştek bi tenê jî nema wek berê bû. Ji bo hemûyan wilo bû. Şiklê axavtinê, şiklê rûniştinê, şiklê xwarinê

û şiklê razanê bûbû bi awayekî din. Rebeniyê, êşê û xemgîniyê tam û rengê xwe dabû hemû tiştan. Xwestin û hêviyên wan ên ji jînê hemû hatibûn guhertin.
Gulçînê biryar da ko her êvara înê, şîva Ûsivo derxe. Çar în bê şîv çûbûn, ew jî li ser hev dan pîra Koçerê û mala Hafiz. Çaxê şîvên xweş, şîvên ko dixwest Ûsivo jî jê bixwe çêdikirin, în ba ne în ba, dibir ji Koçerê re.
Di çaxê wê tofana ko hatibû serê malbatê de, malbata Misto texsîr nekiribû. Him dêya wî û him jî bavê wî, destê dostaniyê ji ber pişta wan nedabûn alî. Meyremê yek ji wan pîrekên ko karên malê dikirin û li zarokan dinerî bû. Bavê wî, Osê Reş, seranserê rojan li ba wan bû û xwe dida ber gelek xerciyan. Dehrojên pêşî hew êvaran tenê diçû »karê xwe«. Dû re, pereyekî baş dabû Meyremê û »van peran bide Gulçînê. Bila ji zarokên xwe re xerc bike. Hemû kes dizanin ko perên helal bi min re tune ne... lê min ev pere bi xwe, şevê din ji berazekî birin. Bila ji min bawer bike ko perên wî li hemû kesan helal in. Bila bê tirs bixwin« gotibû.
Têliyê û Temê mêrê xwe li ber gelek baran rabûbûn. Dist û beroş, wê çûbûn ji nav malan anîbûn û wê xwarin çêkiribû. Xunavê û Selîmo jî gotin nebiribûn ser cîrantiyê.
Melê taxê, Mele Letîf jî her li ba wan bû û êvaran jî Reşît û birayên wî bi xwe re dibirin malê. Evdo û birayên xwe jî diçûn mala Hecî Osman. Hecî Osman her şevê dihat ba wan û wexta razanan ew bi xwe re dibirin. Serdar du hefteyan li ser hev neçûbû dibistanê. Misto û Çeto jî hefta pêşî li ba wî bûn û neçûbûn dibistanê. Hefta duduyan Serdar ew şandibûn. Misto wî çaxî sedema nehatina wî ya dibistanê ji Gulê re gotibû. Gelekî li ber ketibû. Nû Misto jê re gotibû, hêsir ji çavên wê

bariyabûn. Neçûbû malê ba, lê sersaxî bi Misto re şandibû û gotibû ko »pir li ber bavê wî dikeve, bila ên mayî sax bin.«
Ûsivo çûbû, lê êş û kul û xem ji wî û dêya wî re hiştibûn. Aliyekî dara dilgeşiya evîna wan, wilo şkestibû. Buhar xweş hatibû, lê wek ko hatibû neçûbû.
Seranserê buharê giraniyeke xemgîn di canê wî de bû. Ken û kêf û dilgeşî, her carê wek barana derengketî bû. Piçik piçik dihat û zû diçû. Giraniya ko xwe berdida ser canê wî, carnan dibû westaneke giran. Rengê wî sar û kelê bû. Sist bû. Di derheqa pêşerojê de bi şik bû, xemgîn bû. Bi Misto re diaxivî. Misto nav tê dida, hinek can dida hêviyên wî, lê roja din dîsa wek berê bû. Tiştê ko wî bi xwe hisab dikir û didît, wê jîn jê re ne hêsan bûya.
Ûsivo, sala berî mirina xwe, baş kar kiribû. Hinekî zûtir jî hatibû malê. Piştî ko hatibû jî, dest bi karekî din kiribû. Bexçak girtibû. Lehane, pîvazterk, bexdenûs û silk çandibûn. Çile pê de qet betal nemabû. Hatina wî baş bû. Tu kes ji wan nexweş neketibûn. Jê xwaribûn, vexwaribûn, li xwe kiribûn û dîsa jî xelas nebûbû. Gava dabû ser rêya Edenê, têra xwarina mehekê duduyan, ji perên ko hîna zivistanê kiribûn, dabûn Gulçînê. Ji ber wê yekê jî, perên ko li Edenê kiribûn, di cîhê xwe de mabûn, li ba Evdoyê bûrayê wî bûn. Evdo bi wan peran û hinekên xwe, mewîjên Omeriyan kirîbûn û anîbûn bajêr firotibûn dewletê. Ji bajêr jî genim biribû û firotibû Omeriyan. Hinek pere ji wir jî bi ser perên wan ketibûn. Carekê jî çûbû tûtin ji Xursê kirîbû û anîbû firotibû wan gundan. Çaxê Ûsivo emir dabû saxan, perên wan bûbûn duqat. Nêvî ji wan perên serketî jî, para wî bûn.
Bi dû re, çaxê mehên dilaxêvê çûn û havîna dewlemend hat, berê xwe da, pere ketin bêrîkên xelkê, ap û xalan perakî baş di nav xwe de civandin û ji wan re anîn. Çar xal û sê ap bûn. Ew pere û ên wî yên li ba Evdo, kirin

ser hev û li ba Hecî Osman danîn. Dostê Reşît bû. Jê re Hecî Osmanê Gundikî dihat gotin. Dewlemend bû, gelek kar dikirin. Ji lawê xwe yê mezin re, dikaneke lastîkên tirimpêlan vekiribû. Ji ê bi dû wî re, dikaneke qumaş vekiribû. Ji ê din re jî, di nava sûkê de restaurantek vekiribû. Wî bi xwe jî him pembo diçand û him jî dikandariya malê li ser hev dikir. Nîvê dikanên bajêr li ser wî bûn. Wek dewletê bû. Heta wê rojê di tu bazaran de nexesirîbû û perên tu kesan nexwaribûn. Tucarekî zîrek bû û baweriya xelkê pê dihat. Lê sala çûyî pemboyê wî ne baş bû, hinekî destengiya perên hişkpere dikir. Sê caran çûbû hecê. Du jinên wî hebûn,

her yekê ji wan di xaniyekî de bû. Dor bîst zarokên wî ji herduyan hebûn. Lê li gor ko dihat gotin, dilê wî hîna jî di dinyê de hebû, çavên xwe li yeke din jî digerand. Lawên wî ev nêta wî ne rast didîtin û bi xwe nexweş dikirin, lê mal, malê wî bû û xelas nedibû.

Li gor bazara ko kiribûn, wê Hecî Osman her mehê bi qasî nîvê miaşê Mele Letîf bida wan û wê pereyên wan jî wek xwe bimana. Ji bo ko ew pere di salekê duduyan de nekevin û nemirin, bi hesabê Dolarên Emerîkanî dabûnê. Hemû li ser hev, deh hezar Dolar bûn. Li gor bazarê, wê ew deh hezar Dolar, ne kêm û ne jî zêde bûbûna. Reşît û Evdo, du bi-rayên wî, Mele Letîf û du camêrên din jî di wê derheqê de kirin şahid. Çi dibe çi nabe, ji bo ko dû re dostaniya dinyê xera nebe.

Li gor bazarê, roja ko mehek çû û bû yekê a din, wê Serdar biçûya pere ji ba Hecî bianîna. Ji ser erdê bin erdê, wê yekê mehê perên wan amade bikirana. Mele Letîf jî, dema li miaşê wî zedê bûbûya, wê reqema nîvê miaşê xwe li ser du kaxetan binivîsanda û her kaxetekê ji wan, bida aliyekî ji wan.

Ap û xalan bi wî awayî ji wan re li hevdu girêdan û tekûz kirin. Li gor fitûya ko melê dabû, selef di wê bazarê de tune bû.
Ap û xalan tiştekî din jî kirin: li gor şêwira ko bi hevdu re kirin, wê mala apan her salê dims, mewîj û savarê wan amade bikirana, wê xalan jî kavirekî dermale, ava bacanan, pîvaz û fasûliyên sipî bidana wan. Wê her aliyekî ji wan salê pênc olçek ervan jî bidana wan.
Lê Evdo halxweş bû û gelek caran rêya wî bi bajêr diket... wî ne li gor şêwir û bazaran dikir. Salê du-sê kîsên ardê xas, bê hejmar caran kezeb û ser û pê ji wan re dibirin. Mêwe û tiştên din jî, kî ji wan bihata bajêr, bi dest xwe re dianîn.
Ji Mele Letîf pirsîn bê ma dikarin zika xwe jî bidin wan an na. Li gor destûra wî, karibûn heta bi nîvê zika xwe jî bidana wan.
Mele Letîf ji wan re pir baş bû, serê xwe bi pirsên wan diêşand û her demê rêyek didît. Wan jî başiyên wî bi avê de bernedidan û ew ji bîra nedikirin.
Abora mala Ûsivo ma li ser wê yekê.
76 SORÊ GULÊ

Beşê duyem
Serdar û Misto, ji şemiyan, şemiyeke buharê, berî nîro, li sûka Nisêbînê, li ber dikana qunderan a li hemberî sînema havînî, li Gulê û Sêvê rast hatin. Roja duyem a piştî baraneke dîn bû. Du rojan li ser hevdu bariyabû û roja sisyan bi xunaveke di ber bê û rojê re, tavilê êvarê rawestiyabû. Dinya têr avdabû, buhar geştir kiribû. Êdî ezman çik sayî bû. Nisêbînê diçirisand. Rojeke bi hesreta dinyê derketibû û ew bi merdî germ û xweş dikir. Hilmeke jîndar ji dinyê difûriya. Bêhna buhara geş û stewiyayî ketibû bajêr û mest kiribû. Dengê çûkan ji avaniyên bilind li

hevdu vedigeriya. Lebateke geş ketibû sûka bajêr. Çaxê hezar babet karan
û kirînan bû. Mehên dilaxêvê li ser çûnê, bûk li ser birinê bûn.
Herdu zeriyên Hecî Elî jî, ji bo bûkaniya Sêvê derketibûn kirîna qunderan. Êdî roja wê hatibû. Rastderketina hêviyên di derheqa xweşiyên jînê de, ji bo wê li ser rojan bû. Dilê ko bi wan hêviyan dagirtî bû, xwîn û jîn dida bedena wê, ew sor û germ kiribû. Wek guleke di serê şaxan de bû.
Xuya dibû ko bi buharê re, wek çinareke di devê çeman de fûriyabû. Jîn, li ser dev û lêvên wê dibû ken û dirijiya der. Êdî wextê wê bû. Her rojê ji roja din bedewtir dibû û wê şemiyê, xwe bi taybetî xemilandibû û spehî kiribû. Çav kil dabûn, reş û belek kiribûn û xetên birûyan di ser wan re kişandibûn, kiribûn wek du kevanên mêrkuj. Herdu lêv, nîv sor û nîv pembe kiribûn, amade bûn ko di nav simbêlên mêran re bihilin ser dev û lêvên wan. Gava çavên Misto lê ketin, agirê azweriya mêranî di nava wî de rabû û bi bedena wî ket. Lê dereng mabû, ji destê wî çûbû. Xuyabû cara wê ya dawîn bû ko wek qîzeke li mala bavê derdiket sûka bajêr. Karê xwe û çûna ba Xalit dikir. Heger careke din li bajêr xuya bikira, bi gumana xurt, wê di destê Xalit de bûya. Misto jî ev yek zanîbû. Ji ber vê yekê jî, tiştê ko di destê wî de mabû, firkandina zik bû.
Bi her çend peyvên pêşî ko li hevdu vegerandin, hat famkirin ko ji bo karê Sêvê derketine kirîna qunderan û çend tiştên ko ji rihela wê kêm bûn.
Serdar, li Sêvê nerî û »ser xêrê be, hêvîdar im hûn jîneke geş û dirêj bi

hevdu re bijîn« got.

Sêvê bi nazdariyeke mê, »spas Serdar« got û li Gulê nerî. Li kêleka wê hêdî hêdî dibeşişî û li wî dinerî. Sêvê dîsa berê xwe da Serdar û »bi xêr îcar
dora we ye« got. Serdar milên xwe hinekî bi şermokî hejandin, beşişî, lê tiştek negot.
Misto dît ko di nav de maye û jê re sext bûye. Li Sêvê nerî û »bawer be em ê bi xwêdana ji daweta te, herin a wan. Êdî dora wan e. Lê çû, ez rebenê xwedê wilo mam« got û keniya. Ew jî keniyan. Serdar bi şik lê nerî, lê ên din mebesta wî fam nekirin. Serdar, tavilê got, »de ka em ê pêşî
daweta we bikin... welehî Xalit hîna em pê nehisandine... lê hêvî dikim ko me ji bîra nake«.
»Lê hûn dîsa werin, va ye ez û Sêvê ji we re dibêjin... werin« Gulê got.
Lê ji nifşkê ve Sêvê bi ken û xiroşî û nazdarî, »keçê qirikê Gulê, li me dereng e, ka em herin. Heger em dereng bimînin, wê keziyên me jêbikin... zû, em herin« got û ji ba xortan hûrik hûrik meşiyan, çûn.
Serdar di nav ramanan de belawela xuya bû, serê xwe zû berdabû ber xwe, bala wî ne li tu deveran bû, lê heçê Misto bû, dîsa êşê dabû nava wî, tibabekî bi dû wan de, li Sêvê nerî. Xwe dihejand û diherikî, lê zû ji ber çavan şemitî sûka malê biyanî. Kul û hesreta wê, dîsa xwe berda ser dilê wî. Nîvkeserek kişand, serê xwe hejand û »xwedêyo, ma tu dikarî çi qase pîrekiyê bidî hinan! Xalit lê hêja ye, lê xwezî min berî wî bidîta... bila ew tenê bibêje min yek ji xwe re dît...« di dilê xwe de got û xwêsiya xwe daqurtand.
Gava herdu xuşk ji bajêr vegeriyan malê, li serê kuçê, bavê Serdar hat bîra Sêvê. »Keçê qirikê Gulê, em ketin axavtinê û min bavê Serdar ji bîra kir. Ji rengê wî xuya ye ko pir li ber dikeve. Min dixwest ko ez sersaxiyê bidimê. Sozê bide min ko tu dê sibe bibêjî ko ez pir li ber ketime û bila li

qusûra min nenere. Bi xwedê şerm e ko nehat bîra min« got.
»Soz, ez ê bibêjim. Bi rastî jî pir li ber dikeve. Lê wê negotina te nabe ber dilê xwe... ew ne wilo ye«.
»Na, na.. ne ji bo wilo, lê ji bo xweşiya dinyê. Adetên me wilo ne xuşkê«.
Gava »baş e... soz, ez ê jê re bibêjim...« got, ketin deriyê malê.
Roja duşemê, Serdar, ew li dibistanê bir teref û »Gulê, em dilê xwe wi-lo xweş dikin, em xwe ji hevdu re hisab dikin, lê ma gelo wê bavê te, te wilo bi hêsanî bide min? Tu zanî ko ez êdî sêwî û xizan im. Ma tu bi xwe di vê derheqê de çi dibêjî« got.
78 SORÊ GULÊ

Gulê hinekî ket şikê. Ket erê nayekê. Nema zanîbû bê ew hewcedarî ji ko derketibû. Lê bi dû re xwe da ser hev û bi aramî got »welehî bavê min, bi min û te nizane, dêya min sergirtî dizane, lê nizane bê tu kî yî û lawê kê yî. Lê heger mirov ji axavtinên bavê min ên di derheqa tiştên wilo de derxe, qet naxwaze ko yekî di rewşa te de bibe zavê wî. Dixwaze ko keçên wî bigihijin dewlemend û halxweşan. Lê dîsa jî mirov nizane.
De ka heta dor bê hatina te, wê derkeve. Belkî dilovaniyê bike û razî bibe. Lê tu di derheqa min bi xwe de, nekeve tu şikan. Min, tu bi her awan divê. Tu xizan bî, tu rût û tazî bî, tu çi bî min tu divê. Min ahd ji xwedê re daye ko ez ê ji te pê ve serê xwe bi tu kesan re daneynim ser balîfekê. Vêna wilo bizanibe canê min. Bila dilê te safî be û pişta te rast be. Û êdî vaye nêzîkî sê mehan bi ser çûna bavê te dikeve. Ez dixwazim te
hinekî geştir û xweştir bibînim. Do, Sêvê jî, »bibêje Serdar bila hinekî zorê bide xwe û xwe geştir bike digot.« Rast dibêje. Ez fêrî te û ko te geş bibînim bûbûm«.

Bêrîvanê û Cemîla, »dersê dest pê kiriye« gotin û ew bi xwe re birin. Gulê, bi rê de, »em ne mecbûr in her tiştan bi a bavê min bikin« got. Serdar serê xwe hejand û beşişî. Gulê hêvî di dilê wî de bilind kirin. Xwîn di bedena wî de keliya, hedan tê de tenik bû, lê hezkirina di dilê wî de qewîntir bû. Xwest bi destê wê bigire û bi xwe re bibe malê. Lê »na, tiştên wilo li gor adetan dibin. Ez wilo nakim. Lê wê bavê wê, wê nede min... ev yek kifş e... asoxî ez ê mecbûrê revandinê bibim« ji xwe re got.
***
Buhar çû, havîn hat. Hîna berî ko dinya bi germa kamax bişewite, Sêvê giha Xalit. Daweteke mezin ji bo wan geriya. Serdar û Misto jî çûnê. Rasthatiniyek çêbû û Serdar û Gulê ketin destên hevdu. Misto ket destê Perîxanê. Bêrîvanê ket destê Çeto. Qîz û xort li hevdu digeriyan. Dawet, bû daweta qîz û xortên nûhatî.
Sarê ji Qamîşlokê hat dawetê û dîsa vegeriya. Wê ji wir hez dikir, wir mala wê bû, wir bi dilê wê bû. Heger ji destê wê bihata, wê merev, dost û
ezîzên ber dilê xwe hemû bibirana wir. Wir bej bû, rût û germ bû, lê dîsa jî gelekî li ber dilê wê şêrîn û xweş bû.
Rast e, Qamîşlokê xweş e. Lê Nisêbînê jî ne ji ber avê hatiye. Xweşiyên wê jî pir in û cuda ne. Berê bajarekî şîn û avî bû, lê ew jî niha wek Qamîşlokê nîv rût e, bi rojê şewitî ye û li pişt têlan dîl ketî ye. Hew êdî serê çend daran, yek li vir û yek jî li dera han, di hewşan tenê de şîn dikin. Şînkayî li ba avê maye, li jortirê bajêr maye. Nema ne ew bi av û dar û

bexçe ye, ne jî Qamîşlokê bi xan û qesirên bexçeşîn û derge ye. Tiştê ko hatiye serê wan, cezayekî giran e. Lê ev yek, evîndariya wan betal nake.

Dibêjin ko herdu bajar evîndarên hevdu ne. Ji ber wê yekê jî Nisêbînê heta ber têlan e, bi şev û bi rojê li Qamîşlokê dinere. Wek ko dixwaze wê himbêz bike û ji wir birevîne warê çiyan e.
Herdu bajar bi salan wilo bi hesret û kovan li hev dinerin. Hesreta wan, hesreteke mezin û bêhedan e. Êşeke pir giran e. Ew êş û ew hesret, gava ko rûniştvanên herdu bajaran li hevdu par vedikin, diyar e hêsantir e, tê kişandin; sed û pêncî-dused hezar in; lê ji bo du mirovan tenê, pir giran e; qet nayê kişandin. Lê heger ko hat û bû, heger ko hat serê du mirovan, wî çaxî du mirov dikarin misogerî wê yekê bibin. Tiştên wilo hîna jî dikarin bibin.
Qamîşlokê jî wek Nisêbînê, heta ko jê hatiye, xwe ji xetê dûr nexistiye. Di ber xeta bi têl û maîn re, ji rojhilat ber bi rojave de, li dirêjayî ava bûye û maye. Têl û maîn ji hêla rojave ve tên heta rasta nava herdu bajaran, li wir îcar teqlike zalim didin xwe û du-sê kîlometroyan ber bi bakur de hildikişin û dû re dîsa rast berê xwe didin rojhilat, rast diçin û Qamîşlokê û Nisêbînê li wir dihêlin. Qamîşlokê jî li gor wê çiva ko xetê daye xwe, bi jor de hilkişiyaye û şikil girtiye, Nisêbîna xwe bernedaye.
Sûka Qamîşlokê, pir mezin e û li dor hêla çem e. Lê pirtirîn li rojavayê çem dikeve. Ew der, bajarê kevn e. Qesir û qusûr û bexçe li wir bûn. Sûk û her babet dikan û kar li wir bû. Du taxên mezin, li du hêlên bajêr, dû re ava bûne û bajar mezintir kirine.
Piştî herdu taxan, berê du gundên biçûk hebûn. Lê îro her yek ji wan jî çend malên teref ên taxekê ne. Ji xwe herdu tax jî, gava jîna bajarvaniyê ji
a çiyan û gundan re bû alternatîf, ava bûne û herdu gund jî li ber xwe birine. Gundiyên ko pêşeroja xwe di jîna bajarvaniyê de dîtine û ji gundên herdu rexan derketine, hatine li wir bi cî bûne; du taxên mezin ava kirine.

Mala Hisê Şemê (lê topa qîz û bûkên taxê »mala Sarê« dibêjin. Sarê him îdol û him jî berbera wan e) li taxa aliyê rojhilatê çem e. Ne pir teref e û ne jî li ser çem e. Hukmê tîrekê ji çem û qederê kevirekî şivanan jî ji kuça mezin, a ko bajêr li dirêjayî dibire û dike du alî, dûr e. Li bakurê kuçê, li hêla rojhilat û bakurê bajêr, li taxa Qudûr Begê ye.
Çaxê nû ava kiribûn, yek ji malên teref bû. Lê dû re xelk ji çar aliyên welêt hatin û xanî li wir ava kirin, tax mezintir kirin û ew derbas kirin. Niha di nava bajêr de tên hisabkirin. Qesrên bilind li wir hatin avakirin,

dikan û restaurant ketin wir û êdî bi her awayê xwe xuya ye ko taxeke bajêr a ave ye.
Sarê ji zû ve ye bi xwestina dilê xwe li wir e. Ji halê xwe pir razî ye. Mala wê û mêrê wê bi dilê wê ne. Ne tazî ye, ne jî birçî ye û ne jî bi hewî ye. Tiştekî ko êdî li Nisêbînê bike nemaye û dilê wê ne pê ve ye. Wir ji zû ve ji bîra kiriye. Hew dê û bavê wê û xuşk û birayên wê li wir mane. Bi serlêdanên her ji çend salan, pir bextiyar dibe û besî wê ne. Heger ne xwedê bixwaze, nêta wê ko rojekê dîsa vegere tune ye. Li wir hew çêbûye; lê jîna wê heta mirinê li Qamîşlokê xuya ye.
Sarê, wek bûka malê, heta ko Seîdê tiyê wê bizewice û yeke din jî bibe bûka malê û şirîka wê, xwe xwediya malê tevî dibîne. Xelk jî wilo dibêjin. Sarê bi wê yekê serbilind e.
Û ne ko Sarê neheq e. Xanî ê wan e, ne kirêdara tu kesan e. Ev yek tenê hêja ye malê dinyê. Hemû kes ne xwediyên xaniyekî ne. Reben û belengazên bê cîh û bê war pir in. Kirêdarî halekî gelekî nexweş e. Ew bi xwe ne li mala bavê xwe û ne jî li ba mêrê xwe, tu caran wek kirêdar ne jiyaye, nayê bîra wê. Lê dizane û dibîne bê kirêdarî çi kamaxî ye. Ji ber ko ew ne di halekî wilo de ye, pir bextiyar e û her gavê şikiriya xwe tîne.

Hewşa wan ne pir mezin e. Tu tiştekî tê de naçînin; hemû ji bo çûnê, hatinê û rûniştinê ye. Lê dareke wan a tûyê heye. Pelên wê mezin in û şîn wek kevzê ne. Dareke tarî ye, hew serê çend şaxên terefan belawela ne; roj
di wir tenê re dikare derbas bibe. Subhanalah, tu dibê qey ne li wê beja xwedê, lê li newala Bûnisra di ber çemê Çax-Çex de ye. Difûrê û şax jê dikişin çar aliyan.
Xezûrê Sarê, Hisê Şemê di wextê xwe de bi destê xwe çandibû. Hima bibêjin di temenê xênî de ye. Gihaye baş mezin bibe, ser hewşê tevî di-gire. Hiso, îsal serê buharê, ji bo ko rohnî baştir bide hundûran, ji aliyê hewşê ve guliyekî baş mezin û çendikên biçûk di binî re birîn. Lê aliyê din digihije heta ser kuçê. Nîvê çûkên taxê tên li ser datînin.
Tûyeke delal e. Gava ba nerm lê dixe û di nav re diherike, bi hezaran pelên mezin dilerizin, li hevdu dikevin û konsêreke dirêj di ber dengê çûkan re li dar dixin. Heger mirov ji wî babetê muzîkê hez bike, kon-sêreke xweş e; li gor bê radibe û dadikeve. Wek gava ko ew dengê delal ji
mala cîranan, ya jî ji cîhekî dûrtir bê mirov e. Mirov li gelek cîhan di-gerîne û gelek tiştan bibîr tîne.
Yek liban tûyên sipî lê dikevin, lê çûk li hevdu hiltînin, nagihin biweşin û hewşê bilewitînin. Wilo baştir e. Heger ne wilo bûya, diviyabû bibirin.
81
SORÊ GULÊ

Tê gotin ko tû hewşan dilewitînin. Lê tu serêşa wan bi xwe ji ber tûyan tune ye. Berê, zelq bi ser wan de diketin. Niha ew jî çareser kirine. Rûyê du lihêfên kevn bi ser hevdu vekirine, di binya şaxên tûyê re raxistine û pê ve girêdane. Zelqên ko dikevin, li ser wir dimînin. Seîd bîra wî aqilî û

wê hêsaniyê biribû. Serê çar pênc salan wilo dikin. Berê halê wan ne tu hal bû. Hindik mabû ko Hiso wê dara delal di ber binî re bibire.
Xaniyê wan du beş in. Du ode û hêwanek jê, ji rohilat ber bi rojava ve ne û berê wan li qublê ne. Ew beş kevn e û bi kelpîçan e. Her odekê çar metroyan fireh e û şeşan jî dirêj e. Hêwan jî sê metroyan fireh e û bi qasî odan jî dirêj e.
Ew beş, hîna dema Hiso ciwan bû, zarokên wî hûr bûn, Ebû Ferîd dor du salî bû û Seîd tune bû, bi ked û xwêdana xwe avakiribû. Bi oda aliyê rojhilat ve, ode û hêwaneke din jî heye û berê wê li rojava ye. Ew dû re ave
kirine û bi çemento û babetekî perekêtan e û hinekî bilindtir e. Ji ser wir, di ber tûya mala Kamilê Remo re, nîvê minara camiya Mazilevdîn û serê hin malên Nisêbînê jî xuya dikin.
Piştî ko mala Şemê Sarê anîbûn, tê derdixistibûn ko cîhê wan teng e. Wî çaxî rabûbûn ew der ji wê û Ebû Ferîd re lêkiribûn. Lê hew çile û havînekê tenê tê de îdare kiribûn. Di germê de germ bû û di sermê de jî, mixabin sar bû. Ji ber wê yekê dîsa li oda kevn vegeriyabûn. Ên bi kelpîçan ne wilo ne.
Niha dîsa li oda rojava radizin. Hiso û Xanimê li oda din radizin. Oda nû jî ji bo mêvanan û Seîd e. Paceke mezin jê vedibe hewşê. Yeke biçûk jî di aliyê kuçê de ye. Hêwana nû, ji mêvanên ko bi rojê tên û diçin re xweş e, wan li wir bi ci dikin. Di hewşê de, bi dîwarê ko di nav wan û mala Birkê Newalî de ye ve, tiştekî biçûk jî lêkirine; deriyekî baş mezin li ber e û li paca oda Sarê dinere. Ew der jî aşxane û serşok e.
Dora wan bi xaniyan ave ye. Li aliyê wan ê rojava, mala Birkê Newalî heye. Birkê jî bi eslê xwe serxetî ye. Zilfa jina wî dotmama wî ye û ew jî serxetî ye. Piştî ko Hiso xaniyê xwe li wir ava kiribû bi çend salekî, ew jî hatibûn cîrantiya wan. Mirovên sernerm û gotinxweş in.

Li pişt wan, mala Çolo heye, du jinên wî hene. Newîla, a pêşî, wek xezalekê bû, lê dû re çûbû Nofa revandibû. Dil ketibû Nofa, ji ber dilketina wê bûbû wek nexweşan. Piştî ko Xidirê Omerî di dîlanekê de »ez nexweş bûm tayî bûm, ez çûm ba mele Ehmed, got tiştê ko qur`an û kitêb dibêjin, derman û melhem tunene, hew memikên Nofa derman in« gotibû, Çolo, xwe û dermanê xwe di klamê de dîtibû û çûbû Nofa re-

vandibû. Niha dêya du zarokan e. Lê ew û Newîla qet li hevdu nakin, her rojê dawet li mala wan e. Çolo jî dikeve nav wan û zarokên wan û hemûyan dide ser hev. Wî çaxî, mala wan dibe wek gava ko rovî dikeve koxika mirîşkan. Her yek ji aliyê xwe ve dike qîj-qîj û qaj-qaj. Ew qet li hevdu nakin û Çolo jî pir li wan dixe.

Lê aliyê wan ê rojhilat, pişt ode û hêwana nû, hîna vala ye. Berê wir, ji aliyê kuçê ve dor deh-pazdeh metroyan e, li dirêjayî jî dor bîst û pênc metroyan heye. Sê aliyên wir ave ne. Hêla kuçê tenê vekiriye. Wir jî bi rêzeke dîwarê pirîkêtan hatiye pêçan û deriyekî text li ber e. Berê çend darên zeytûnan û çendek jî ên hejîran di wir de hebûn. Du devî û tûyek jî hebûn. Niha deverin ji dîwêr hilweşiyane, qul tê de vebûne. Derî jî baş hevdu berdaye. Lê darên wir hemû hişk bûne, hew tû tenê şîn maye. Berê dema wir baştir parastîbû û darên têde şînbûn, dêlikek carê dihat li wir diteliqî û cewrikên xwe mezin dikirin. Lê ew jî nema tê, xwedê dizanê li deverinan miriye, ya jî li nav maînan cîhekî baştir diye.

Ew der wilo bêxwedî maye. Camêrekî ji zû ve ew dera han ji bo ko ava bike kirîbû, lê heta roja îro ava nekiriye; diyar e piştî ko kiriye, belan ha-tine serê wî. Ji ber ko ji wî çaxî ve hew carekê tenê jî lê venegeriyaye. Dema hatibû kirîbû, Hiso carekê ew dîtibû. Jê re gotibû ko wê bê ava bike. Lê hîna jî nehatiye û tu kes nizane bê camêr kî ye, li ko ye û ya jî çi

hatiye serê wî. Hew xelk dizanin ko ew der, ê yekî ye.
Bi sedema ko wir hîna nehatiye avakirin, ode û hêwana mala Şemê, a nû, havînan pir germ dibe. Sibehan, heta ko roj diqulipe dahnê êvaran, ji wê devera vala ve li dîwêr dixe û disincirîne, dike wek dîwarê firnê. Gava roj dibe dor nîro, li wê odê bazar bi germê re nabe. Lê ew dara tûyê, nêzîkî dîwêr, rasta hewanê ye. Ew hinekî alîkariya ko qet nebe hêwan ji derve ve
bi rojê ne sincire, hêniktir bimîne, dike.
Sarê dêya du zarokan e; lawikek û keçikek. Ferîd ê mezin e, heşt sal kirine û Nesrîn jî di heftan de ye.
Ebû Ferîdê mêrê wê, tu xwendina zêde nekiriye. Ji ber wê yekê jî di wextê xwe de, tu karên ko him bikaribe pêşeroja xwe pê ve girêbide û him
jî bikaribe bike, nedîtibûn. Demekê kirîn û firotina li ser nigan dikir, lê niha dikaneke wî heye. Malê biyanî difiroşe. Bi munasebeta karê xwe gelek mirov ditine û gelek caran çûye Şamê û Helebê. Du caran jî çûye heta Bêrûdê. Ji aliyê din ve jî, du caran çûye Diyarbekirê û Entabê û carekê jî heta Stenbolê çûye. Ev deh-dozdeh sal in ko wî karî dike.
Sarê, heta roja zewacê jî, hew carekê tenê Ebû Ferîd dîtibû. Çaxê xwest-
83
SORÊ GULÊ

inê bû. Wî çaxî bi destê xwe kahwe çêkiribû û biribû ji xwazgîniyan re. Ew jî wî çaxî di nav wan de bû. Lê piştî birinê, hevdu hêdî hêdî nas kiribûn, bawerî dabûn hevdu û xweşiya jîna jin û mêrantiyê di nav wan de ave bûbû. Hêdî hêdî dîtibû ko xortekî cirxweş û lihevhatî ye. Ne dirêj û ne jî kin e. Niha hinekî qelew bûye, hinekî kintir xuya ye, lê tu xisar di kinbûn û qelewbûna zilaman de tune ye. Heta roja îro neketiye tu şikan

û lê poşman nebûye. Ji roja pêşî ve bi dilê wê ye û pê re dilgeş e. Xwedê jî
ev yek zû dîtibû û zarok dabûn wan. Lê piştî herduyên pêşî, hîna tu yên din nedane wan. Bêhna xwe li wan fireh kiriye.
Hin dibêjin ko »çil lê ketiye, ji ber vê yekê nema zarokan tîne.« Çaxê ko Nesrîn anîbû, çaxê heftikan, cîraneke wan jî zabû. Du mal di nav wan de bûn. Li gor ko tê gotin wî çaxî ji sersarî derzî bi hevdu neguhertibûn û dû re jî dengê wan çûbû hevdu. Hin jî dibêjin ko »çavînî bûye«. Lê ew û Xanimê bi xwe, »dan û nedana zarokan karê xwedê ye, gava ew bixwaze dide û çi gava ko nexwaze jî nade. Heger derket ko çavînîbûn û çil e, herdu jî ne bêçare ne« dibêjin.
Carê gava Sarê karên malê xelas dike, tê li tenişta Xanima xesûya xwe rûdine û di derheqa hezar tiştan de diaxivin. Di taxa wan de mêrê kê lê xistiye, kî zaye, kî bi xeyd û kî jî bi dilê xwe çûye mala bavê xwe, kî dermanan di xwe dide û keça kê ser rût û çîm tazî ye, dinya çiqasî buha bûye, rûn û şekir li dikana kê hene... her rojê ji nû ve lê vedigerin û ji nû ve ji hevdu re dibêjin. Zahmetiya bê wê di derheqa çi de biaxivin, qet nabînin. Hezar tişt li dinyayê dibin û li ser zimanan digerin. Ew jî dibihîzin û ji hevdu re şirove dikin.
Firavînê bi hev re amade dikin. Tu wextê zêde nagire. Roja Sarê kincan naşo û tiştekî taybetî nake, karên wê yên rojane kifş in. Her rojê wek hev in. Danheva malê, şuştina firaxan û rêşkirina mal û hewşê. Sarê ji karên wilo re dest sivik e; fêr bûye, dizane bê wê ji çi dest pê bike û çawa bike. Piştî wê, îcar dor tê rûniştina bin tûyê. Xweşiyeke bêhempa ye. Ew wilo dizanin.
Rojên wan wek hev in. Her li malê ne û karên malê dikin. Hindik caran bi hevdu re derdikevin sûka bajêr. Karên wan li bajêr dernakevin. Rojên havînê wek hev in û ên çile jî wek hev in. Havînê li bin tûyê rûdinin û di-

axivin, çile jî li ber sobê rûdinin û diaxivin. Rojên ko Sarê kincan dişo, Xanimê jî xwarineke sivik çêdike û bi qasî ko dikare malê dimalije. Mal malijtin, a rastî berî ko Sarê di ber şuştina kincan keve dike, lê ew jî ji bo ko dilê xwe di cîh xe, rojên kincşuştinê xwe bi tiştikên hûr mûr

dadixe. Dixwaze bibîne bê çi li ko ye, çi ne li cîhê xwe ye, çi wenda bûye û ya jî şkestiye. Lê Xanimê dîsa qusûrekê di malê de nabîne.
Sarê hêjayî pesindanê ye. Bi bejina xwe dor sed û heftêyî dirêj heye. Dagirtî ye, li ser xwe ye û hîna tu nexweşiyan rêya xwe tê de nedîtine. Gava dimeşe, serê xwe bilind dike û bi bawerî dimeşe. Wî çaxî cotê memikên wê û kêlekên wê dihejin û deng ji ber nigên wê tê, sawê dide dora xwe. Hîna tu şopên tadahiya dinyê lê xuya nakin. Dêya du zarokan e, lê hîna wek qîzeke bîst salî bi reng û xwê ye û hîna piçekî tenê jî ji forma bedena pîrekiya ciwan derneketiye. Newqa wê zirav e, teniştên wê ti-
je ne, nav milên wê hildayî ne û çîm dirêj e. Memikên wê bilind in û wek goştê hemû derên wê step in, hîna tu derên wê sist nebûne. Ji ber wê yekê
jî zilamê ko ew dîtibe û dilê xwe nebijandibe wê, tune ye. Lê Sarê, heta roja îro xwe hew li mêrê xwe ragirtiye, qet rê nedaye hinên din da bên û sînorên ko wê ji bo parastina pîrekiya xwe li dora xwe danîne, derbas bikin û xwe nêzîkî wê bikin. Lê ew çi bike jî, bi çêkirina bedena xwe pîrekeke balkêş e. Xelk xwe bi devê xwe tamsar nakin, lê di dilê xwe de tê
nabuhurin.
Gava xelk serevdan didin serê jinên xwe, heger ko nas bin, bi giramgirî qala wê dikin û dibêjin »li minê, tu jî wek Sarê yî, Sarê hêja ye sedên wek

te« û heger ko ne nasên wan ên ji nêzîk ve bin, dibêjin »ihimm... li minê bûka mala Şemê ye, bila ew tenê bibêje ez jin im û hew. Em jî dilê xwe xweş dikin û dibêjin em bi jin in.« Ji ber wê yekê, dijminên wê jî ne hindik in.

***

Sarê, berî sêzdeh rojan ji Nisêbînê vegeriyabû. Bîst rojan li wir mabû. Gihabû ko bajêr tevî ji nû ve bibîne û gelek tiştan bibihîze. Lê mala ko bûk tê de tunebin, xerabe ye. Heta gava ko vegeriyabû, qiyametek kar li bendî wê ketibûn ser hevdu. Lê Sarê kevaniyeke nedîtî ye. Di rojekê duduyan de kiribûn û ji ber xwe derxistibûn. Niha, karên malê dîsa hatine qeysa xwe. Karên wê, dîsa hew karên rojane ne.

Rojeke germ bû. Ji rojên din hinekî germtir bû. Hewa giran û tîr bû. Gava mirov bêhna xwe digirt û berdida, hewa dibû giraniyek û diçû ser kezeba mirov. Wek ko hewa di nava mirov de dinepixî, hemû der digirtin. Sênga mirov li dil û kezeba mirov teng dihat. Xwêdan wek avê ji mirov diherikî. Ji hêla Sahra Ereban ve bayekî germ hêdî hêdî dihat. Dema li rûyê mirov dixist, wek ko agirek di ber bêvila mirov re bişemite li mirov dihat. Wek ko ji nav êgir ya jî ji dojehê dihat û li rûyê mirov dix-

ist. Hewa hemû girik bû û bi mij bû. Ewrekî qet-qetî girtibû ezmên û hêdî hêdî bi aliyê çiyan de diçû. Gava diçû, diket hezar şiklan; pan dibû, dirêj dibû, di ser hevdu re diqulipt û diçû. Lê dikir û nedikir, nikarîbû rojê bigire û veşêre. Ji bo wilo tenik bû. Ji xwe ko bigirta jî wê tu hênikayî neketiba hewê. Gava roj derdiket, di nav ewran û mijê re agir berdida dinyê. Tiştê ko ewran carê digirt jî, wek ko rojê li ba xwe hiltanî û dû re bi carekê re bi ser herdu bajaran de dirijand. Gelo wê nîro çi bikira!

Sarê, piştî ko karên malê yên sivik kiribûn, hatibû li bin tûyê li tenişta xesûya xwe rûniştibû û dest bi tiştên ko hîna ne gihabû jê re bibêje kiribû û hêdî hêdî digot. Sarê, hewş avreşandî kiribû û malijtibû. Bêhna axê xweş kiribû, difûriya. Dengê çûkan ji ser tûyê dihat. Hinek nû ji çar aliyan dihatin ser tûyê, hinekan fira dawî didan xwe û diçûn nêçîra dahnê sibehê. Li kuçê dengê zarokan dihat, bi fotbolê dilîstin. »Goool«, dengê Ferîd bû. Bi serbilindî guhê xwe da kurê xwe. Wê bîstikê motorekî li nav wan xist û derbas bû. Qijakek li ser tûya mala Kamilê Remo bû, deng jê qut nedibû, tax hemû bi xwe dihisand.
Sarê û Xanimê tenê li malê bûn. Jê re bahsa Nisêbînê dikir. Tiştên ko di bîst rojan de dîtibûn, bi gotinê xelas nedibûn. Nisêbînê mezin bûbû, gihabû heta îpek ê. Apartmanên li sûkê dihijtin ezmên. Xelk ji çar aliyên welêt hatibûn û lê bi cîh bûbûn. Hezar babet kar û şixul lê derketibûn, bi hezaran bêkar û xizan hatibûn li wir sitirîbûn. Gelek gundiyên Xanimê jî li wir hebûn.
Sarê dixwest hemû tiştan jê re bibêje. Tiştên di derheqa daweta Sêvê û mala wê ya nû de, di çend rojên pêşî de gotibûn. Êdî dor hatibû tiştên din.
Sarê gelek tişt jê re digotin. Bê ji nasan kî sax e, kî mirî ye, bê kî dewlemend bûye, kê qesrên bilind lêkirine û çend caran çûne hecê, bê kê keça kê ji lawê xwe re xwestiye, kî li sûka bajêr bûye xwedî dikan, hemû digotin. Heft-heşt rojan hew qala tiştên wilo tenê kiribûn. Tiştên ko nedihatin bîra wê, ya roja din dihatin bîra wê, ya jî gava Xanimê pirs jê dikirin, dihatin bîra wê û digotin. Çi cara ko diçû Nisêbînê û vedigeriya, karê wê û Xanimê ev bû. Ta jê re bi derziyê vedikir, tiştekî negotî nedihişt.
Xanimê jî pir bextiyar dibû. Carê di navinan re, gava bêzariyê digirt be-

dena wê, bêyî ko gotina Sarê bibire »erêêê, erê dinyayê« digot û destê xwe
yê rastê, wek ko ji ber êşeke xedar rahnê xwe bifirkîne, di ser re dibir û di-
anî.
86 SORÊ GULÊ

Ne tenê gava Sarê qal dikir hêsanî û bêzarî herdu di ber hevdu re di be-
dena wê de peyde dibûn. Kê qala serxetê bikira bi baldarî guhdarî dikir.
Karîbû sê rojan li ser hev li tiştên di derheqa serxetê de guhdarî bike.
Hezkirina wê ya ji bo jor, hezkirineke mezin bû. Ne hezkirin tenê bû,
hezkirin û hesret bi hev re bûn. Malbata wê tevî ji Trîşêrînan bar kiribû
binxetê, lê dilê wê bi wir ve mabû. Birayekî wê li wir mabû, jê re Cimoyê
Şêxo dihat gotin, ew jî berî bi çend salekî miribû. Laloyê birayê wê, di ci-
waniya xwe de bi êşa zirav miribû. Çend zaroyên Cimo hebûn, lê ew û ew
bi ser hevdu de nediçûn û nedihatin; şop ji ser hevdu wenda kiribûn.
Xanimê pir li ber wê yekê jî diket.
Sarê kul û kederên wê di hevdu rakiribûn. Xanimê di nav wan de
mabû. Dîsa kir ko bibêje »erêê, erê« lê dengê wê di bin ê qijakê de wenda
bû. Hew lêvên wê dilebitîn. Qijaka bêhnteng wê bîstikê hatibû û li ser
tûya wan danîbû. Dengê wê guhên mirov ker dikir. Piştî çend dengan,
dîsa da xwe û çû ser tûya mala Kamilê Remo. Hewaleke wê hebû. Lê piştî
ne bi gelekî, dîsa hat. Êdî hinek hedanî ketibû dengê wê. Sarê her digot û
Xanimê guhdar dikir. Êdî bêzarî di bedena wê de giran bûbû, hêdî hêdî
bi paş de, bi nav wext de vedigeriya. Dû re ew bêzarî hêdî hêdî pirtir dibû
û cîhê bextiyariyê jî digirt. Hemû tiştên ko heta wê rojê li ser rêya jîna xwe
dîtibûn û di jînê de bûbûn sedema bêzariya dilê wê û her babet qirik-

tahliya wê, dihatin bîra wê. Raman lê kûr û giran dibûn, êdî tişt û bûyerên li dora xwe ji bîra dikirin, hew ên dema çûyî dihatin bîra wê. Bûyer bi dû a din de, bi lez di ber çavên wê re diherikîn û diçûn. Warê wê û çaxê xortaniya wê ji nû ve dihatin bîra wê. Gava dêna xwe didayê, didît ko gelek tişt nema wek xwe ne, gelek tişt wenda kirine û gelek kesên ko pir ji wan hez dikir, îro êdî tune ne. Hin bi destên dewletê, hin bi destên xelkê û hin jî bi emrê xwedê mirine. Her carê, ev tiştên ko dixwest bibîr bîne, bi wî awayî, gava hin ji serxetê dihatin û jê re bahsa wir dikirin, dihatin bîra wê û dilê wê dihat givaştin, yek liban hêsir ji çavên wê digindirîn ser dev û lêvên wê yên kevnar û bi xemgînî keserên kûr vedidan. Êşekê ew dixwar. Dîsa wilo lê hatibû, dîsa li ser jor û emrê çûyî nexweş ketibû. Carê »erê... erê, dinya xopan lê nehêja ye... wek do bû, lê dîsa jî pir zû çû« digot.
Wextekî dirêj ketibû nav wê rojê û wan demên ko dihatin bîra wê.
Gava ji nû ve li tiştên di derheqa serxetê de guhdarî dikir, baştir tê derdixist ko emir çûye, tiştekî ko lê hêja be nemaye. Li ber diket û diêşiya. Salan hemû tişt li ba xwe hiştibûn. Xuya dibû ko poşmaniyeke xemgîn, rengekî

cuda dide rûyê wê. Çermê wê xavtir û sisttir bûbû, qermîçonkên rûyê wê kûrtir bûbûn û di navnan re lêvên wê biêş û xem dilerizîn. Li ser rûyê wê xuya dibû ko extiyarî ji ber gelek sedeman ne xweş e û kereh e. Xuya dibû ko extiyarî navê êşê, kerehiyê, bêgaviyê û di gelek hêlan de ê xizanketinê ye. Extiyarî navê wendakirina gelek tiştan e. Gelekan diêşîne û poşman dike. Hin jê li ber malbata ko belawela bûye dikevin, hin jê li ber mal û milkên ko wenda kirine dikevin, hin jê li ber qeweta zend û bendên ko pola hûr dikirin dikevin, hin jê li ber spehîbûn û bejin û bala delal

dikevin û hin jê jî li ber her babet xweşî û evîndariyên xwe dikevin. Gelekên ko ji ber sedemên taybet tenê, bêbazar dixwazin her demê xort û zinde bimînin; naxwazin qermîçonkan di rûyê xwe de û porê sipî jî di serê xwe de bibînin, hene. Hinên din jî tu tam û xweşiyê ji guhertinên ko di jînê de dibin, nakin. Her babet xweşî û dilgeşî hêdî hêdî li paş dimînin, bi wan re nameşin û nayên. Rojekê, tew dinerin ko çar aliyên wan hew bi bêzariyan rapêçayî ne. Wê yekê wek xaîntiyekê li xwe dibînin. Gerek ne wilo bi xaîntî bûya. Çavên xortaniyê birijin ko di wext de rojên extiyariyê nabînin û rêya xwe ji ser naguherin. Bêguman dûrketina ji warê zarokatî û xortaniyê jî sedema wendakirina gelek xweşiyên jînê ye.
Çîroka Xanimê direj e. Coka jîna wê û a Hiso, di nav sextiyên jînê re çûbûn ser hev. Ji ber wê yekê, çîroka jîna wî jî bûbû a wê bi xwe. Çîrokeke direj û bi jan û êş bû. Ew ji gundê Tirîşêrînan bû û Hiso ji Kelehka Şewitî bû! Heta roja ko ew gihabûn hev jî, hevdu bi çavan nedîtibûn. Lê dîsa jî herdu bûbûn para hevdu. Hîna gava ew biçûk bûn, bavê wan wilo li hev kiribûn. Hevalên hev ên nêçîra kewan bûn, gelekî ji hev hez dikirin. Gotina ko ji hev re gotibûn, diviyabû biçe serî.
Hîna berî ko herdu bibin şirîkên jîna hev bi çend salekî, çend malên pismam ji gundekî çiyan, ji Kelehka Şewitî, bi malbatî xwînî bûbûn û li Qamîşlokê bi çîh bûbûn. Malbat, bi navê Mala Devreşan dihat bi-navkirin. Hiso ji wê malbatê, lawê Xelê Kewê bû. Lê bi dû re ew nav li ba wî hatibû guhertin, bûbû Hisê Şemê.
Şemê dêya wî bû. Pîreke jîr bû. Nivînên bûk û zavan çêdikirin, pîrik-tiyeke baş dikir û qirik hiltanîn. Ji ber wê yekê navê wê zû ket dewsa ê Kewê. Ji xwe çûbûn îcar Xanima ko Kelehka bi meşê dor saetekê dûrî wan bû wek warekî dûr û xerîb zanîbû, piştî rabûna ji gund, anîbûn heta Qamîşloka di binê beriyan de.
Zewaca wê, zewaceke bê dilê wê bû. Ketibû nav xizaniyê. Xela bi ser

xizaniya wan de hatibû. Lawek jê re çêbûbû û hîna sal nekiribû, miribû.

Bavê wê, piştî zewaca wê bi çend mehekî miribû û mirina wî ketibû stûyê wê. Ji gunehê wê re miriye, nifir lê kirine dihat gotin. Her çend salên pêşî, birayê wê yê mezin çûna ba wê li xwe heram kiribû. Ew yek, kuleke din bû. Heta ko Kewa keça wê jê re çêbû û bi dû re jî xwedê bi derengî Felemezê ko jê re Ebû Ferîd tê gotin dabûyê, ji nû ve dilê wê bi dinyê û ba Hiso xweş bûbû. Ji xwe heta ko Seîd çêbûbû, tu bêdiliya wê nemabû. Li Qamîşlokê ji malbatê tevî re neqediyabû. Piştî hatinê bi çend salekî, hinan ji wan bar kiribûn Helebê û Şamê. Lê li wir jî ji wan re neqediyabû. Ji wir jî bar kiribûn Bêrûdê û hin jî vegeriyabûn serxetê, çûbûn Stenbolê. Mala Kewê tenê li wir mabû. Lê Xelo jî zû miribû û mal di stûyê Hiso de hiştibû. Wî çaxî nû zewicîbû û hîna nû digiha karên giran. Lê di nav Mala Devreşan de ê ko bi kêrî xwe hatibû, dîsa jî ew bû. Xortekî xebatkar bû û bi dest û lepan şareze bû. Bi bejin û bala xwe jî di nav sed zilaman de
diket çavan û bi her awayan li gor çakûçê xwe bû. Him bi desthilanîn bû û him jî karekî ko nikarîbû bikira tune bû. Ji kişandina avê bigirin heta bi lêkirina dîwaran, paleyiyê û barkêşiya ser têlan dikir. Carnan bi roj diçû paleyiyê û bi şev jî diçû ser têlan, diçû bar dikişandin. Xelkê radihişt çewalekî, wî bi xwe dudu bi hevdu ve girêdidan û radihişt wan.
Yekî din jî wek wî hebû. Ew hinekî jê ciwantir bû. Jê re Elî digotin, ji Midyadê bû, lê mala wî li Nisêbînê bû. Tu kesan nizanîbû bê lawê kê bû û ji kê bû. Gava mereqdaran jê dipirsîn, »ez cinnî me« digot û gotin kin dibirî. Xelkê gotin di ber Elî re nediajot. Lê hewcedariya wan bi hev hebû. Hevdu baştir nas kiribûn û bûbûn destbirakên hevdu. Bi ser hev-du de çûbûn û hatibûn û dostanî bi hevdu re kûrtir kiribûn. Gava li

sûkan di ber hev re dimeşiyan, hemû kesan li wan dinerî. Sûk ji ber wan diqelişî û vedibû. Dilê xelkê pir dibijiya wan û saw ji wan digirtin. Gava di ber hev re dimeşiyan, karîbûn bi sawa ko didan dora xwe, kezeba şêran di sênga wan de biqetînin û wan ji desthilanînê de bixin. Zilam nedihatin milên wan. Di zikê xelkê de ko herdu birayên hev in.
Dostaniya xwe domandibûn û her ko çûbû kûrtir kiribûn. Êdî îro ne dost tenê bûn. Êdî merevên hevdu bûn, zarokên wan ji hevdu hebûn û malbatek bûn. Sarê, keça wî Elî ye.
Hiso, malbat bi sextiyên pir mezin ji wan çaxan anîbû. Xanimê, êşên jînê hemû pê re kişandibûn. Dihatin bîra wê. Xaîz bûbû û him kûr di wan tiştan difikirî û him jî bêdeng li Sarê guhdarî dikir. Xwe fêr kiribû, him karîbû bi dilekî şkestî di bêzariyên çûyî birame û him jî li tiştên di derheqa serxetê de guhdar bike. Hîna ji guhdarkirina gotinên Sarê têr

nebûbû. Hîna li bendî gelek tiştên ko wê jê re bigotina bû. Lê Sarê, ji nifşkê ve bêdeng bû û ma; tiştên ko karibûn bigotina hemû ji hişê wê çûn, lêdana dilê wê hinekî xurttir bû, rengê wê hinekî hatibû guhertin û ziq li Xanimê dinerî. Gava Sarê gotina xwe birî, xewna xeyala Xanimê, wek ewrekî ko bi ber bayekî xurt bikeve, ji ber çavên wê wenda bû û çû. Veciniqî. Wek ko bibêje »ma tu çima nema dibêjî« bi awayekî dilşkestî serê xwe hilda û lê nerî.
Bi nerîna xwe re, tê derxist ko tiştin di bin zimanê Sarê de hene û jê re nabêje. Sarê hin şikên sivik li xwe peyde kiribûn. Hinekî di erê nayê de bû. Lê bi dû re, ne pir bi derengî biryara xwe da: »tu xeter di gotinê de tune ye, xesûya min cirxweş e. Ya wê kêfxweş bibe û ya jî wê bibêje, na keça min, ev yek nabe« ji xwe re got û bê dilê xwe bala xwe da qijaka ko

ji sibêhê de şîq-şîqa wê bû. Wê gotina wê di bin dengê wê de wenda bû-ba. Guh diqelaştin.
Li ser şaxekî bilind danîbû. Çûkan xwe du metroyan nêzîkî wê nedikiriin. Newêrîbûn. Gava çavên wê bi wan diketin, xwe li wan xwar dikir û bi wan ve diqedimî. Çûkên reben jê ditirsiyan û difiriyan. Carnan di ber xwe de dikirin çîz-çîz û gazin dikirin, lê qijaka bêhnteng tu deng nedibirin xwe û nedihedinî. Li kûçê, her ji bîstikekê dengê motorekî di-hat û zû li kuçê difitilî. Carnan pîkap jî diçûn û dihatin. Dengên zarokan li kuçê kêm bûbû, êdî dinya germ bû, hew carnan dihat. Kifş bû ko ji de-verinan diçûn deverin din. Ne ko li kuçan dilîstin. Ew jî rêwî bûn. Germê, kuçe ji xwe re vala dikirin.
Berî ko Xanimê bipirse, Sarê dest pê kir û gotina xwe got.
»Jinapê, ez dixwazin tiştekî ji te re bibêjim, lê heger ko bi aqilê te nekeve, ji tu kesan re nebêje. Tu wek dêya min î; ez tu xeletiyê tê de nabînim û ji ber wilo ez dikarim ji te re bibêjim.«
»Çi ye keça min? Xwedê xêr bike. Ma qey tiştin nexêrê yên ko bûne û te heta niha ji min veşartine hene«.
»Na, tiştin nebûne. Ez dixwazim tiştekî din ji te re bibêjim.«
»De ka bibêje bê çi ye, keça min!«
»Seîd xortekî baş e û tu dizanî ko ez wek birê xwe jê hez dikim...«
»Ez dizanim keça min... Ma qey dilê te hiştiye keça min? Heta bê malê ez ê...«
»Na jinapê, na. Dilê min nehiştiye. Ez pir jê razî me û pir ji min re baş e...«
»Ma nexwe çi bûye?«

»Tu tişt nebûne. Di nav min û te de, ez dixwazim tiştekî xêr ji te re

bibêjim. Seîd dibistan qedandiye û di wextê xwe de ye. Tu dizanî ko xuşkeke min hebû. Cara dawî gava te ew dîtibû, hîna zarok bû. Min jî ji zû ve nedîtibû. Min vê carê dît ko gihaye, bûye wek çinarekê. Pir spehî ye. Gava min dît, Seîd ket bîra min. Min xwest ez te pê bihisînim. Heger ko tu rast bibînî, ez dixwazim ko keçeke wilo spehî ji wî re be.«
Kul û kovavên ser dilê Xanimê di xewnê de man. Ricfa ko dabû bedena wê, lê sist bû. Xwîn û xweşî di bedena wê de geriyan. Zewaca Seîd hat ber çavên wê. Ji bêzariyan zû azad bû û »ma tu qala Gulê dikî! Ma wilo mezin bûye? Niha çend salî ye?« got.
»Şazdeh sal kirine. Ketiye huvdehan.«
»Maşele. Keçik çi zû mezin dibin. Tê bîra min... hîna gava biçûk bû jî gelekî spehî bû, wek sêveke xelatî bû«
»Ne tu nizanî jinapê, bê çiqasî spehî bûye. Wek hîvê ye... mirov fedî dike lê binere. Û bi bejina xwe jî wek min e... û êdî wextê Seîd e.«
»Welehî xebera te ye keça min... wextê wî ye... tu baş dibêjî... madem tu wilo baş dibînî, wê wilo baş be. Ma te li ber guhên dê û bavê xwe xistiye?«
»Na weleh, ez nû ji te re dibêjim. Min newêrîbû... karibûn bixeyidin û bibêjin, tu dikî bi xwe ji xuşka xwe re mêran bibînî. Min newêrîbû.«
»Heqê te heye keça min, wilo ye« Xanimê got û hinekî li ber xwe nerî û dû re gotina xwe domand: »Keça min welehî wextê Seîd e, lê bi a me nake! Ma ka em ê çawa bikin, keça min? Xortên vê heyamê hew bi a xwe tenê dikin... tu dibê qey wê bizinan bikirin; heta ko nebînin nayên ber tu bazaran. Hezar caran gotiye a ko ez bînim, divê ez wê nasbikim ya jî ez baş bibînim. Fedîbûn ji dinyê rakirine. Tu nemaye ew bi xwe herin ji xwe re jinan bixwazin. Ax!.. em ê hîna çi bibînin û çi nebînin! Divê hevdu bibînin. Heger Seîd wê nebîne, dinya hemû lê bibe yek jî, ew ê neke û xwe nede ber tu bazaran.«

»Wilo ye jinapê, hew bi a xwe tenê dikin. Bav nema karin bavitiya xwe bikin. Nema karin sozekê di derheqa keça xwe de, ya jî li ser navê lawê xwe bidin camêrekî. Dû re, na, min navê, dibêjin û bavê xwe fedîkar derdixin.«
Gava Sarê wilo got, Xanimê çavên xwe qijilandin û ma. Kirina wê bi xwe hat bîra wê. Zû di ber çavên wê re şemitî. »Lê a min ne wilo bû... min hew nedixwest ez ji Trîşêrînan herim... min ji xerîbiyê hez nedikir... lê ên niha, dibêjin divê em hevdu bibînin« di dilê xwe de ji xwe re digot û tu

şaşî di kirina xwe de nedîtin. Dû re, »na, keça min, na heram be, tu kes nema wêre sozekê bide. Nizanim bê em ê çawa bikin û çilo ê me razî bikin!«
»Min sûretekî wê bi xwe re aniye, ez ê şanî wî bikim. Heger mala bavê min zanîbûna ko ez ê wilo bikim, tu sûret nedidan min.«
»Welehî ev baş e! De ka heta bê malê, ez ê di nav xwe û wî de bibêjim. Ka bê çi dibêje. Lê ka sûret werîn ez bibînim bê çawa ye.«
Sarê bi lez rabû ser xwe, çû hundur û bi wê lezê jî vegeriya. Bi rê de li sûret dinerî û ji xwe bi xwe re dipesinand. »Xwedê bisitirîne, wek hîvê ye«. Bi serbilindî da destê wê û »wek hîvekê ye« got. Sûretekî wek destekî mezin bû û ji newqê ve bû. Spehîbûna wê hemû eşkere bû. Xanimê ji destê wê girt û nezîkî çavên xwe kir, xwe bi ser de xûz kir û ne bi derengî di derheqa spehîbûna wê de biryara xwe da û got »maşele wek xezalekê ye. Xwedê bisitirîne pir spehî xuyaye. Ma qey xort li serxetê qeliyane? Ev kezîzer çawa heta niha hiştine?«
»Nizanim jinapê! Dema min dît, ez jî ecêbmayî mam. Çawa heta niha tu kes nehatine û ew nebirine. Min pirsî, bê ma tu kesan nexwestiye!

»Weleh xelk tên dixwazin lê tu kesan nake, `ez ê dibistanê bixwînim` dibêje« gotin. A rastî ên ko hatibûn xwestibûn, ne bi dilê bavê min jî bûn. Ji ber vê yekê heta niha maye. Lê digotin ko yekî din heye, wê wî bike, lê wê bavê min nede wan, him feqîr in û him jî çiyayî ne. Ez nizanim bê kî ne, lê digotin ko hîna nehatine nexwestine. Lê heger bên jî, li gor ko dêya min digot, bavê min li darê dinyê nade ên wilo.«
»De ka bila Seîd bê malê, ez ê jê re bibêjim. Ez ê li ser vê yekê bisekin-im. Lê divê em niha amadekariya firavînê bikin, keça min. Em ê dereng bimînin.«
Sarê, bêyî ko tu zexeliyan bike »baş e jinapê, ez ê destên xwe sivik bigir-im. Niha!« got û bi sivikbûna gîskekê nig dan ber xwe û rabû û got, »lê tu ji tu kesên din re nabêjî ko min li ber guhên te xistiye, ne jinapê?«
»Na keça min! Ma ez ê herim ji kê re bibêjim! Bila dilê te safî be«.
Sarê pişta xwe da Xanimê û çû aşxanê. Ji ber serketina kirina xwe dilgeş bû. Dilgeşî di dilê wê de dibû gotinên xweş û ji wê bi xwe re dihatin gotin. Dilgeşiya wê li ser dev û lêvên wê xuya dibû. Ji kêfan destên wê wek ên Chaplîn dixebitîn û xwarin amade dikir. Pêşniyara wê bi serê xesûya wê ketibû û wê bikira ko bibe. Ji xwe heger ko wê dil bikira, hew dima Seîd tenê. Heger Seîd qaîl bûba, Ebû Ferîd jî qaîl dibû. Wî çaxî tu tiştekî ko Hiso bigota tunebû. Ji xwe Hiso di wê derheqê de bi piranî wek pîra xwe

û ên din dikir. Gelek caran dema qala tiştên wilo dibûn, »hûn li hev bikin, ez jî bi we re me« digot. Ji zû ve ye xwe nema tev li karên dinyayê dikir. Lawên wî mezin bûbûn, êdî dora wan bû. Baweriya xwe anîbû ko êdî tu vatiniyên wî li vê dinyê nemabûn. Wilo ji bo xwe rast didît û wilo dikir. Lê dîsa jî diviyabû wek bav, di derheqa zewaca Seîd de gotina dawî bigota. Lê Sarê bi hêvî bû. »Ma wê çima nebe, sedema ko nebe çi ye« ji

xwe re digot.
Bûna wî tiştî ji bo Sarê sedema bextiyariyeke mezin bû. Ew bi xwe ji jî-na xwe û mala xwe xweş bû. Xwedê ji min re »li hevdu aniye, ez li ba mêrekî baş sitirî me. Ma heger ez jî wek Newîla cîrana me bûbûma para yekî zalim, hewî bianîba ser min, min ê çawa bikira! Na, xwedê neke gidî. Her roja xwedê ko heye, mêrê wê lêdixe! Heta niha du diranên wê şkan-dine. Na gidî na, xwedê mirov bisitirîne! Ebû Ferîd wek berxikekî cirxweş e. Mala Şemê hemû wilo ne. Ez xenê bûme. Wê Gulê jî xenê bibê, wê ew jî wek min bisitir e« ji xwe re digot. Ne ko ev tişt ne rast in. Mala Hiso maleke baş in. Xerabiya xelkê nakin û tu tiştên wan û tu ke-san diber hevdu de nema ne. Tiştên kevn çûne hatine jibîrakirin. Ji xwe xelkê ji berê de zanîbûn ko mala Kewê dûrî xerabiyan in. Lê a ko pir girîng e, ko Sarê bi xwe gelekî ji wan razî ye. »Cirxweş in, ne diz û xeberok û pevçûnkir in, li mirov naxin. Seîd xwendiye jî, cirxweş û bedew e. Xortekî li hevdu ye, ne kin e û ne jî dirêj e. Ma wê Gulê yekî wilo ji ko peyda bike. Avakirina tiştekî wilo, xêr e. Wek ko mirov sê caran here hecê ye. Ne pir qîzên bavan vê demê li ba mêran disitirin. Vê demê gelek bi qeweta perên xwe, baş û qure xuyane; zahr xweş û gotin şêrîn in, lê dû re
bêbav derdikevin. Xwedê tu kesên wilo bi ser Gulê veneke. Lê ma mirov ji ko dizane. Mirov nikare ji dilê xelkê bixwîne, mirov nizane. Na, na gidî na! Tu kes ji Seîd ne çêtir e. Wê her roj li ba min be. Bila ew û Seîd di oda nû kevin, herduyên din besî me yên din in« digot.
Sarê zû bi tiştên ji bo firavînê, ji aşxanê derket û dîsa hat bin tûyê ba xesûya xwe. Hîna berî ko Sarê rûnê, Xanimê pirsek pê ve gihand:«Sarê, keça min heger tu nebî ber dilê xwe, ez ê tiştekî din ji te bipirsim«.
Sarê ji Gulê û spêhîbûna wê piştrast bû. »Ka bibêje jinapê. Ma wê çima dilê min bimîne, tu jî wek dêya min î!«

»Xwedê bike ko dêya te tu êşan li dinyê nebîne û sed salan bike. Keça min, mala bavê te maleke baş in, di limêj û rojiya xwe de ne û ji xwe fedî ne. Keça min, lê mirov dîsa jî nizane. Qîzên ko diçin dibistanan ne wek min û te ne. Ne servekirî û çîmrût e ne?«

93

SORÊ GULÊ

»Na jinapê, xwedê mirov bisitirîne. Bavê min tiştekî wilo li darê dinyayê qebûl nake, ji xwe fedî dike. Em hemû sergirtî bûn. Ew jî sergirtî ye. Lê ji ber ko diçe dibistanê nikare fîstanan li xwe bike, şal li xwe dike û li wir servekirî ye. Divê wilo li xwe bikin; fîstanên dirêj qebûl nakin. Lê li malê... na gidî... bila dilê te di cîh de be, wek min û te ye.«

»Keça min, ez bi dê û bavê te bawer im, lê hindik qîzên bavan nixumandî mane. Ji ber vê yekê mirov piştkul e. Dema ez pîrekan wilo servekirî û çîmrût dibînim, aqil di serê min de namîne. Em gihane çi heyaman. Xwedêyo tu gunehên me efû bikî! Hin heta jora kabokên xwe berdidin û derdikevin sûkê. Heger xwedê rojekê êgir jî bi ser me de bibarîne, ne pir ecêb e«.

»Xebera te ye jinapê. Hetîketî ye. Şikir, tu kes ji me wilo tune ne. Welehî ez û Ebû Ferîd helalên hevdu ne, lê dema ko carnan bêhemdê min piçikekî ji çîmên min dibîne, ez fedî dikim. Îcare xelk çîmên xwe pêş zilamên bajêr hemûyan dikin. Çawa dikarin wilo bikin, ez nizanim. Serê min jêbikin jî, ez bi xwe nikarim wilo bikim.« got û rabû dîsa çû aşxanê. Xanimê dilê xwe kiribû cîh. Gotinên Sarê ketibûn serê wê. Gulê, a ko jê re bibe bûk bû. Dilê xwe xweş dikir û ji xwe bi xwe re »keçeke nasan hêja ye deh keçên xerîban. Ev deh sal in ko Sarê bûka me ye, lê hîna rojekê tenê jî serê me ji ber nizm nebûye. Xwedê wê ji çavan bisitirîne, wek

kihêlekê ye, wek desmaleke ser destan e. Bê çawa em jê razî ne, xwedê jî
wilo jê razî be. Îcar yeke din jî wek wê bi ser me vebe, ez bimirim jî êdî ne-
ma xema min e. Wilo sernerm, cirxweş û binamûs e. Heger ko deh lawên min hebûna, min ê deh bûkên wek wê di mala xwe xistina. Gulê jî edeba xwe ji dê û bavê ko Sarê mezin kirine girtiye. Ma ka zilamên wek Hecî Elî û hermeteke wek Stiya kevaniya wî. Xwedêyo... tu mezin î, tu a baş dizanî û tu her tiştan ava dikî. Hebe nebe, te ev kirina ji xêrê kiriyê dilê Sarê û aniye ser zimanê wê. Madem te wilo rast diye, em ê vê yekê jî wek her tiştên din bi kêfxweşî bi a te bikin. Me her demê daye ser rêya ko te daye ber me. Tu kerîm î, tu rehîm î, tu dibînî û xelata wilo didî me. Şikir ji te re, ji mezinbûna te re, ji heqî û merdiya te re« digot.
***

94 SORÊ GULÊ

Beşê sêyem

Rojeke sêşemê, Gulê, Bêrîvanê, Cemîla û Perîxanê hevdu girtin û çûn barajê. Gava Gulê û Stiyê, Sarê bi rê kiribûn Qamîşlokê, di vegerê de, li bajêr li Bêrîvanê rast hatibûn. Wê û Gulê ji bo seyraneke wilo, wî çaxî li hevdu kiribûn.

Hîna berî ko germ bêhnê li dinyê biçikîne xwe gihandin nav daran. Cîhê herî xweş ji xwe re girtin. Piraniya barajê ji wir ji wan ve xuyabû. Cîhekî hinekî bilind bû, nîv dikek bû, raserî hemû deveran bû. Xwarin û ava sar ji bo navrojê û Coca Cola jî ji bo vexwarina kêfê bi xwe re biribûn. Geh radibûn digeriyan û geh jî dihatin rûdiniştin. Roja xwe wilo derbas dikirin. Her ko roj diçû, hejmara xortan li dora wan pirtir dibû. Bala Cemîla tenê li ser wan bû. Carê awirên provakativ li ser xortan di-

gerandin û bi wan re dibeşişî û ew sor dikirin. Gava Perîxanê ji bo wê kirina wê bi gazindarî lê dinerî, awirên xwe ji ba wan dianîn ber xwe û hinekî sor dibû. Li gor wê, nedibû ko li wir, li devereke ko ji hemû kesan ve xuya ye, li pêş çavên hemû kesan flortan bi xortên xelkê re bikin. Xort, xort in, wek mêşan in, mirov çi bike jî ew tên. Lê heger mirov hay ji xwe hebe, tu kes nikare mirov tawanbar bike.
Gulê, serê Misto di ser rêza çamên qusandî re dît. Pê re rengê kêfxweşiyê li rûyê wê da der. »Belkî ne tenê ye, her demê herdu bi hevdu re ne« di dilê xwe de got.
Misto çarçav dibû, xwe dihejand û dihat, dixwest hemû kesan bibîne. Baraj tije bû. Çi dara ko hebû, malbatek dudu li bin rûniştibûn. Bêhna hezar babet xwarinan difûriya. Dengê klamên cuda ji teypên xelkê bilind dibûn. Li hêla jêr, li ber qeraxa çem, zarokeke pêçekê digiriya. Yek caran dengê ordekan jî ji wir dihat. Xort, dudu dudu, sê sê ketibûn destên hevdu, ji seriyekî diçûn heta seriyê din, li qîzan dinerîn û tolazî dikirin. Pir li hêla Gulê û hevalên wê dinerîn. Keriyekî zarokên dor şeş-heft salî hevdu girtibûn, li wê navê bi dû hevdu diketin û guh ker dikirin. Xwe li bin çengên xortan dixistin û ew ji hevdu de dixistin. Ji jor, ji ser daran, dengê babet babet çûkan diket guhan. Zeloleyekî li ser darên wî aliyê din ê çem,

xweş dixwend. Dengê qijakan ji çar aliyan bi ser hemû dengan diketin. Gava ba ji hêla başûr dihat, bêhna gulan û çaman bi xwe re dianî. Lê bêhna avê û masiyan, giraniyeke cuda didan hewayê. Ji hêla bakûr, ji ba xortên Cizîriyan bêhna araqê difûriya. Ji wan bi wir de jî, xortên Dêrikiyan hebûn. Ji bo ko wan û ên Cizîriyan disa pevçûn bikirana, ne pir mabû.

Awirên çavên Misto ji ên bazan tûjtir bûn. Çavên wî qîzên ciwan û be-dew ji hemû tiştên din zûtir didîtin. Wî jî, hîna ji dûr ve Gulê û hevalên wê dîtin. Hemû nas dikirin, hemû ên dibistanekê bûn. Berê xwe rast da ba wan. »Roj baş, gelî qîzan« got û xwe di nav Gulê û Perîxanê de berda ser kabokan.
»Roj baş, Misto, tu bi xêrê hatiye« lê vegerandin.
Misto, »dora we jî tije xort bûne, hûn dibînin« got û kenek bi ser de kir.
»Lê ew karê we ye, ma min çi jê ye! Ez tî me, ka tiştekî vexwarinê bidin min gidî, welehî ez buhurtime«.
Perîxanê Coca Cola ji selika ba xwe derxist û bi giramgiriyeke ko qet pê nediket dirêjî wî kir. Bû sedema ken û henekan. Sohbeteke dilgeş li dar xistin. Kenekî ji dil bi hev re kirin. Piştî çixarakê, »tu çima îro tenê yî Misto« Gulê got.
»Serdar bi tevrikçiyan re çûye tevrikê, ew bûye Gandî, dixwaze bindest û belengazan azad bike. Ji min re jî got »wer«, lê min got na ezbenî, ez nikarim bêm tevrik mevrikê, destên min diêşin, lê ez ji tiştên din re amade me« got û gulpa Cola a dawî vexwar û rabû ser xwe. »Xêr ji bo min
di we de tune ye, ez ê herim ji xwe re bigerim...« Hinekî keniya, destê xwe
ber bi Gulê vekir û got »Gulê dildara hevalê min e, Bêrîvanê çavên xwe li malmezinan û dewlemendan digerîne û yekî wilo di çavê xwe rakiriye. Heçê Perîxanê ye xwedêgiravî sozdara mixaletiyê xwe ye, lê me tu kesên ko mixaletiyên wê ne nedîne û Cemîla jî ji pêçekê ve destgirtiya pismamê xwe ye. Na bavo na... ma ez li vir çi dikim? Bêaqiliyan!.. spas ji bo Cola« got û ji ba wan da rê.
Gulê »ma tu ne birçî bû Misto, te tiştek nedixwar, xwarin jî li ba me heye« got.

Misto, di ser milê xwe re fitilî û got »na spas, ez ê silavên te bibêjim, roj baş«. Him digot û him jî destê xwe dihejand û dimeşiya. Çend gavên şaş avêtin, hindik mabû ko pêl du zarokan bike. Gava xwe ji ser wan da alî, beroşa malika Cizîrî ket pêşiya wî. Tiştek nebû, lê jinikê dîsa jî »we... hêdî hêdî yabo, feke ber nigên xwe, tu dê wê berûşa germ bi ser me dakî... tu

dê me û zarîkên me bişewitînî« got. Misto bi awirên poşmanan dîsa li pişt xwe nerî û kenekî ji mecbûrî kir. Dît ko Perîxanê sênga xwe difirkîne û dikene.
Misto ji ber çavan wenda bû. Qîz li cîhê xwe man. Heta ber êvarê li wir man. Seyraneke xweş kirin. Germ, wek ko dor bêriyan ji ser dinyê hati-bû girtin. Bi wan wilo dihat.
Êvarê, Misto çû Serdar dît û serpêhatiya xwe jê re got. Ji bo ko ne bi Misto re bû, hinekî bêzar bû. »Ax, wê çiqasî xweş bûya! Min ji zû ve ew nediye. Lê... lê heger her kes bi dû xweşiya ji bo xwe tenê bikeve, nabe, di-
vê hin wan karên din jî bikin« di dilê xwe de got. Dixwest ji xwe bawer bike ko a rast, wek ko wî bi xwe kiribû ye, lê xwestina dîtina Gulê, ne tiştekî sivik bû.
Serdar, roja din dîsa çû tevrikê û Misto jî heta bêriyan xewa şêrîn kir. Serdar û Îsko, bi Xelo re çûbûn ser erdên Nezîr Hindî. Li nêzîkî bajêr, li binya Baqisyanê bûn. Heta dor bêriyan hewa xweş bû, lê jê û pê ve êdî dinya dikeliya. Serdar di ber berê xwe de, baştir tê derdixist bê çi agir dibariya. Xwêdana wî diket çavên wî, diherikî ser dev û lêvên wî. Xwêdana şor, çavên wî dişewitandin. Xwe rast kir û bi zendika qutikê xwe zuwa kir û keserek veda. Bêhna axa hêwî ket bêvila wî. Bêhna erotîz-ma axê bû, bêhneke cuda bû. Pir pê xweş hat. Wî çaxî bayê germ ji hêla

başûr ve hat û çend ziman li rûyê wî xistin û şemitî hêla çiyan. Serdar xwe sipart tevrikê xwe, serê xwe hinekî hilda, li rewşa rojê nerî. Rêya ko wê roj
bi bêhnfirehî tê re biçûya û ji nû ve li wan bikira êvar, hîna nîvê ezmanê fireh bû. Gava xwest bihesibîne bê çiqase wext e, qudûm lê şkestin. Cîhê ko wê tê re wenda bûbûya, pir dûr bû. »Heta ko roj bi meşa gêrikan here wir, hîna nû dibe êvar... wê ruhê min here« ji xwe re got. Hîna gelek mabû. Lê li zarokên li tenişta xwe nerî û »ên ji min qelstir jî hene... wê roj bibe êvar« got. Li hêla çepê Îsko dît, di nav qîzan de pir zinde xuyabû. Dû re, berê wî ket hêla bajarê Qamîşlokê. Ji dûr ve wek xirbakî xuya dikir. Serê çend daran tenê di ser xaniyan re xuya dikir. »Mirov dikare hemûyan bihejmêre... ma gelo bi rastî bajarekî wilo rût û bej û germ e... heger wilo be, ma gelo çima bajarekî xweş e tê gotin« ji xwe re got. Dema baş dêna xwe dayê, dît ko toz û dûmaneke tenik girtiye ser bajêr, rewrewkên germê ji bajêr diçin. Gava di nav van raman û xeyalan de bû, çawîş hat û »ha gelî xortan ha... de lêxin... me îro hîna tu ber ji ber xwe denexistiye... divê em îro vî erdî xelas bikin... ha çavê min ha« got. Serdar ji bêgavî ji nav xeyalan vegeriya û bala xwe da tevrikê.

97

SORÊ GULÊ

***

Êdî roj di nîro buhurtibû. Lê hîna di ser herdu bajaran re bû, rast ji jor ve bû, bi wir ve aliqî bû û mabû. Ezman çik sayî bû, hew li aliyê çiyan ê ro-jhilat tenê piçek ewrê sipî hebû. Incex bi qasî cîhê bênderekê hebû. Wek ko berf li wir hatibû û mabû. Lê hew ew bû, piçeke din ji dermanan re tune bû. Ezmanê pak û fireh, seranser, hemû bi rojê mabû. Wê jî, bi merdî rê li xwe fireh kiribû û diçirisand... êdî du-sê caran ji xwe mezintir

bûbû. Wek ko hew ji bo herdu bajaran tenê hilatibû. Li rasta herdu bajaran, tîrêjên xwe yên zîvînî, wek şûrên tazî bi çar aliyan de berdabûn û ezmanê şîn tîşwîşî kiribû. Ezman çirisandibû, êdî çav tê de venedibûn. Wek ko rojê hemû tiştên xwe li wir xerc dikirin. Nêta wê ko tiştekî bi xwe re bibe derin din tune bû. Bêhn li dinyê çikandibû. Mirovên ko hîna li derve bûn, ji ber germa wê, di reveke eşkere de bûn. Xanimê bi xwe li bin tûyê bû. Sarê li aşxanê bû. Çûk bêdeng bûbûn, xewa navrojê dikirin. Ew qijaka bêhnteng, dîsa çûbû ser tûya mala Kamilê Remo û hinek haşî ketibû dengê wê. Hewaleke wê hebû, lê ma ka çi bû! Belkî maran, ya jî tiştin din çêlîkên wê xwaribûn, ya jî hevalê wê li derinan hatibû kuştin! Ew bênhtengî ne bê sedem bû. Pisîka mala Zilfa bêhna goşt kiribû û hatibû li tenişta Xanimê veketibû.

Zîqînî bi deriyê hewşê ket, Hiso hat. Carê tep-repa ber nigên wî, hîna gava li kuçê bû, dihat. Malî fêr bûbûn, wilo di hatina wî derdixistin. Lê wê navrojê Xanimê tenê li hewşê bû, deng neçûbûyê, Hiso ji nifşkê ve hatibû. Guhên pîra wî hinekî giran bûbûn, deng ji wilqasî dûr ve nediçûnê.

»Ev derî xir bûye, dîsa zîqîniya ko lê dikeve... yanî min gotibû ez ê hinek zeyt bînim û tê bidim, lê min ji bîra kir« Hiso got û çû li tenişta pîrê rûnişt. Kumê xwe ji serê xwe kir û bi desmaleke biçûk xwêdana xwe zuwa kir.

Sarê li aşxanê pê hisiya ko hatiye. Derket û jê pirsî bê ma wê dew vexwe ya jî avê.

»Welehî keça min heger tu tasek dew bidî apê xwe, tu dê baş bikî. Mirov vê germê zuwa dibe. Wax wax wax, ma ev çi ecêb e gidî! Serê çûkan dişewite. Ma gelo xwedê me ceze dike, ev çi ye! Welehî ev qase roj

û germ ne rast e bavo« got.

Xanimê gotina wî bi xwe nexweş kir. »Paş porê sipî wilo nebêje Hiso, tu dê xwe gunehkar bikî. Bi karê xwedê neaxive!«
»Ma xwene min çi gotiye Xanê? Ma gelo min derewin kirine? Welehî

germ e û xezeb e. De ka tu jî derkeve kuçê ber rojê, tu dê bibînî bê çi germ e. Tew hin li ber vê germê karan jî dikin! Xwedêyo tu çêkî û sebrê bidî wan«.
Sarê wî çaxî çûbû, ketibû dû anîna dew, ew li ba wan ranewestiyabû, lê deng çûbûyê. Di ber xwe de bi axavtina wan dikeniya û »weleh xebera apê min e, pir germ e. Niha Ebû Ferîd jî bi rê de ye, mala min bişewite, niha zimanê wî ji tîna gazekê ji devê wî kişiyaye« ji xwe re got.
Sarê, zû bi taseke dew vegeriya. Hiso tas bi ser xwe dakir, simbêlên xwe zuwa kirin û »dew di vê germa kamax de çiqasî xweş e, wek dermanê dok-
toran li laşê mirov tê. Ma ne xebera min e Sarê, keça min... ma ne zêde germ e«?
Sarê, xwe bi wê pirsê, di halekî ne pir ewle de dît. Dikir ko di nav duduyan de asê bimîne. Wek kê bigota, dîsa jî nedibû. Lê rêya navê a ko jê re baştirîn bû. Xwe zû da ser hevdu û »belê apo, welehî hinekî germ e, lê karê xwedê ye, ma em çawa bikin!« got.
»Binere, tu dibînî Xanê... Sarê jî hevaltiya min dike« got û bi serbilindî beşişî.
»Tu dê Sarê jî vê navrojê gunehkar bikî Hiso... qala tiştin din bike xwedê ji te razî... porê te sipî wek berfê ye, tu çima bi karê xwedê û germa wî diaxivî. Germ be, ne germ be, ew dizane camêrê xas«.
»Her ko pîra me mezintir dibe, bêtir dibe sofî û di dîndariya xwe de ser-
hişktir dibe. Em çi bibêjin, hûn ê xwe gunehkar bikin dibêje«.

Xanimê him serê xwe dihejand û him dikir niç niç û xwe li ber gotinên wî dixist. Sarê li wan guhdarî dikir û di ber xwe de dibeşişî. Dîsa vegeriya aşxanê, li xwarinê nerî, sênîk û kevçî mevçî amade dikirin.
Tavilê dengê Ebû Ferîd û Seîd li pişt derî, li kuçê hat. Gava ketin hewşê, pifînî li Ebû Ferîd ket û gazin ji germê kirin. Xanimê, ji bo wê yekê, hinek gezin ji wî jî kirin, lê Hiso hevaltiya wî kir. Sarê zû bi taseke dewê din hat derve. Herdu biran bi dorê vexwarin û xwe ji xwêdanê zuwa kirin. Piştî ko li halê bavê xwe pirsîn, rabûn av li rûyê xwe kirin û man li bendî danîna firavinê.
Sarê çavên xwe li ser hemû tiştan gerand. Kêmasî tunebûn. Ji aşxanê derket û pirsî: »ma ez firavînê deynim, ya hûn ê hinekî din bêhna xwe vekin?«
»Niha keça min, welehî em birçî ne, yan na zarono« Hiso got. Herdu lawan jî wek wî gotin.
»Nizanim bê zarokên me li ko manê« Xanimê got.
99
SORÊ GULÊ

Hiso got »ma ji we re ne gotin bê wê li ko bin«.
»Ferîd got ez ê derkevim, bigerim. Lê nizanim bê Nesrîn li ko ye. Ma tu nizanî bê Nesrîn li ko ye keça min, Sarê?«
»Belê jinapê, li mala cîrana Zilfa ye, li ba Şîlana wan e, ji xwe re dilîzin« got, çû ber dîwêr û dengekî gazî Nesrînê kir. Gava gaziya xwe dubare kir, Zilfa ji hewşê bersiv da. »Nesrîn li vir e cîrana Sarê. Ma ez gazî bikimê?«.
»Erê weleh, bi xêra xwe bişîne malê.«
Dengê Ferîd jî ji kuçê dihat. »Em ê ber êvarê dîsa herin, ez ê bêm mala we« ji hinan re digot.
Heta ko zarokan dest û nigên xwe şuştin, Sarê xwarin li hêwana kevn

raxist. Sêniyeke mezin tije girar bû û yek jî tije tirşik bû. Dora sifrê bi tas û kevçiyan û şînkayî xemiland. Piştî raxistina hemûyan, di ser sifrê re rawestiya, kontrol kir û »de ka kerem bikin apo« got. Hiso da xwe û rabû, da pêşiya malbatê û hêdî hêdî kişiyan hêwanê.
Bi malbatî girtin ser sifrê. Li ne gelek malan wilo ye, lê li mala Şemê bi xwe, çi gava ko mêvan tune bin, hemû bi hevdu re dixwin. Pêşî ji Sarê re ne hêsan bû ko bi zilaman re bixwe. Bi taybetî ji Hiso şerm dikir. Lê ni-ha êdî fêr bûye. Salên pêşî hima nîvtêr ji ser xwarinê radibû. Xanimê, her carê »şerm neke keça min, apê te ye, wek bavê te ye, têr bixwe« digot, lê
ne wilo wek ko wê digot hêsan bû. Lê wê rojê ji kêfan re hindik xwar û zû rabû. Xwarin bi dilê Hiso bû. Çend carekî di ber xwarinê re got »xwedê ji we razî be, welehî we tirşikeke xweş çêkiriye, girar jî pir lê hatiye«.
Malbata Şemê, li gor gelek malbatan gelekî demokratîk e. Kêm caran pevçûn û bêtifaqî li mala wan derdikevin. Gava ko tiştin biqewimin, li hevdu guhdarî dikin û dû re li hevdu dikin. Her yek ji wan karê xwe dike û wek ko zane bawer dike.
Heçê Seîde, ew komunîst e, tu vatiniyên dînî nayne cîh, lê îşê xwe ji ên din jî nayne. Her wilo tu kes jî îşê xwe ji wî naynin. Ebû Ferîd ne ko-munîst e, lê dîsa jî limêj nake. Hew meha Remezanê, ji ber ko rojiyê di-gire, limêj jî dike. Sarê, limêj dike, lê ne dîndar û sofî ye. Heta mirov çavên xwe bigire û veke, limêja xwe dike û radibe. Carnan dibe ko limêjê ji bîra jî bike. Gelek caran wilo tê serê wê, lê dû re, gava lê vala dibe, qeza dike. Xanimê rojê pênc wext limêja xwe dike. Ne hew ferzan tenê dike, ew gelek limêjan dike. Ji bo gunehên xwe, ji bo ên dê û bavê xwe, ji bo ummeta pêxember, ji bo miriyan, ji bo ko tu qeda û bela neyên serê mal-bata wê û ji bo xêran li xwe pirtir bike, limêj dike. Ew sofiyeke asê ye. Şêxê

wê heye. Lê Hiso ne sofî ye û tu şêxên wî tune ne. Ew misilmanekî li halê
100 SORÊ GULÊ

xwe ye, limêja xwe dike, rojiya xwe digire û ne zêdetir. Zivistanê, hew rojên înan tenê diçe camiyê. Lê havînan her rojê diçe. Limêja nîro û esir li camiyê dike. Carê saetekê duduyan li wir radizê jî. Wir hênik e û xweş e. Ya jî carê li hinan rast tê, li ber siya dara di hewşa camiyê de rûdinin û diaxivin.
Piştî ko xwarina xwe xwarin, Hiso wek her rojê rabû û berê xwe da camiyê. Ebû Ferîd çû oda xwe; çû razanê. Zarokan da dû wî. Her roja xwedê, karê wan jî wilo ye. Di bajarê Qamîşlokê de, tu kes nikare di wê germê de wek wî xweş raze. Ecêb e. Kirasê xwe ji ser çîmên xwe dikişîne heta ber zikê xwe û dibe pix-pixa wî. Top jî biteqin şiyar nabe. Xwêdan di bedena wî re dide der û diherike, lê ew tê dernaxe. Malî gelek caran henekan di wê derheqê de lê dikin, lê jê re xêr xeber e.
Seîd jî rabû û çû hêwana din, perwane xebitand, rahişt kovarekê û xwe li ser dîwanekî dirêj kir. Ew jî radizê, lê berî ko razê, carê çend rûpelan dixwîne. Ev jî adeteke wî ye. Lê ew nikare wek Ebû Ferîd xweş razê. Ew ji germê hez nake. Ji ber germê û xwêdanê, zû radibe avê li xwe dike û dîsa
diçe ji nû ve kovara xwe bi rastî dixwîne. Xuya ye ew razana wê bîstikê, besî wî ye, rehet dibe.
Sarê, wek her carê bi firaxan daket û Xanimê jî dest bi karê xwe yê limêjê kir. Heta ko çend qam limêj kirin, Seîd dîsa wek her rojê bi ifîn û pifîn rabû ser xwe û bi avê ve beziya. Gava vegeriya cîhê xwe, pîra dê jî bi dû wî de ket hêwanê. Tê derxist ko karê wê bi wî bi xwe heye. Berî ko ew jê bipirse, pîrê çû li hemberî wî rûnişt û dest pê kir.
»Tu zanî kurê min, ez ê tiştekî ji te re bibêjim, lê heger bi serê te nekeve,

bila di nav min û te û Sarê de bimîne. Henek bi tiştên wilo nabin...«
»Xêr e yadê? Ma te hin ji min re dîtine?«
»Tu ji ko zanî?«
Bi bersiva wê re, terqînî ji dilê Seîd hat. Bi henekî gotibû, lê rast derketibû. Wê navrojê ne li bendî pêşniyareke wilo bû. Ji ber wê yekê, xiroşiyeke sivik girt goştê canê wî. Lê xwe zû da ser hevdu û got »wa!.. ma
bi rastî wilo ye«.
»Erê welehî. Lê ma tu ji ko dizanî ko me hin ji te re dîtinê?«
»Ez tiştekî nizanim yadê, min henek kir, lê vaye rast derket«.
»Erê kurê min, rast e. Me ji te re yek diye. A rastî Sarê diye. Xuşka wê ye. Pir spehî ye, mirov fedî dike lê binere. Wek xezalekê ye û xwende ye« got û li xwe fitilî ko gazî Sarê bike, lê dît ko li ber derî ye. Sarê destên xwe bi pêşmalka xwe zuwa dikir û bi şik ber bi wan ve diçû.
101
SORÊ GULÊ

»Ka Sarê keça min, tu ka werîn, bila bibîne«.
»Tu çi dibêjî yadê, ka çi werîn tu dibêjî?«
»Nexeyide kurê min, ez dizanim ko tu dê biecibînî«.
Seîd şaş mabû. Xwe li ser dîwanê rast kir û »wê Sarê çi bîne yadê, tu çi dibêjî, we çi kiriye?« got.
»Ne xeyide kurê min, me tiştek nekiriye. Sarê sûretekî wê bi xwe re aniye. Lê heger nekeve serê te, divê tu soz bidî ko tu ji tu kesan re nebêjî, heyfa Sarê, guneh e. Bi ûcaxa bavê kal heger dê û bavê wê pê bihisin ko wê ev rê bi ber me xistine, li darê dinyê nema wê dihewînin mala xwe.«
Wek ko hatibû bi paş de vegeriya hundur. Ebû Ferîd û zarok di xeweke kûr de bûn. Lê dîsa jî ji bo ko şiyar nebin, li ser tiliyan meşiya. Dolav wek

dizan hêdîka vekir û sûret ji bin kincan derxist û vegeriya.
Seîd, wek ko ji darekê de bikeve lê hatibû. Wê navrojê, ne li bendî tiştekî wilo bû, ji pêşniyareke wilo re ne amade bû. Ji ber wê yekê bêdeng rûniştibû û wilo baldar li wan dinerî û guhdar dikir. Tê derdixist ko pêşniyareke girîng e û divê biryareke bi aqilane bigire û bersiveke wilo bi aqilane bide wan. Nikarîbû wek ko dêya wî berê jî, gava çend carekî din jê re bahsa hinan din kiribû bibêje »ew a han« û gotin birîbû, bike. Îcar bi awayekî din bû. »A ko bahsa wê dikin, xuşka Sarê ye û rewş ne henek menek e, ji dil e. Ez qet nikarim xwe bi bersiveke kin jê xelas bikim. Ez nikarim dilê wê bihêlim, ez nikarim di derheqa tiştekî wilo girîng de wê bi gotinên sivik bêzar bikim. Heyfa Sarê« ji xwe bi xwe re digot û di-ramiya. Dû re, rê bi ber xwe dixist: »divê ez guhdar bikim û bersiveke sivik nedim. Zû dilê wê dimîne«.
»Seîd keko tu dizanî ko mirov ji xuşka xwe re li mêran nagere. Lê tu ne xerîb î û tu baş î. Dilê min ji te re dixwaze, hingî qîzeke spehî ye, ez dixwazim ko ji te re be. Min her gavê bi qasî birayên xwe ji te hez kiriye. Ji ber vê yekê ez dibêjim«.
»Ez zanim Sarê, ez baş zanim. Min tu caran ji bîra nekiriye ko wilo ye. Bawer be ez jî te wek xuşka xwe ya mezin dizanim. Ez gelekî kêfxweş im ko tu dikarî tiştên wilo ji bo min bikî. Ji bo ko tu dixwazî xuşka te ji min re be û tu bi xwe dikarî bê vê xwestina xwe pêşniyarî min bikî, ez pir kêfxweş dibim. Ma îcar ez ê çawa bikaribim bikim ko ji ber kirinên min, dilê te bimîne, ya jî tu dilteng bibî. Na, bila dilê te safî be. Lê ez bi rastî bibêjim, we îro ez teng zeft kirime. Ez nema zanim bê ez ê çi bibêjim«.
Sarê sûret bi serbilindî da destê Xanimê. Dîsa hinekî lê nerî, »wek xeza-lekê ye« got û dirêjî wî kir. Seîd rahişt sûret, lê nerî û bi destê xwe ê çepê

pişta stûyê xwe xurand; dû re destê çepê jî anî alîkariya destê rastê û sûret
bi herdu destan rasttir ragirt û ji nêzîktir ve lê nerî.
Bêdeng bûbû. Nîvxemgîniyeke sivik di rûyê wî re xuya dikir. Ya jî, belkî wilo xuya bû, belkî ji xemgîniyê pirtir, xiroşî bû. Lê tiştê ko baş eşkere bû, ji bo ko bikaribe bersivekê bide wan, diviyabû çend saniyên din derbas bibin. Pêşniyareke surprîz bû. Herdu nigên wî ketibûn soleke teng. Sûret di nav destên wî de bû û herdu enîşkên xwe danîbûn ser rahnên xwe. Xwe hinekî bi ser destên xwe û sûret de xûz kiribû. Dû re serê xwe hêdî hêdî rakir û awira xwe ji sûret birî. Herdu destên wî di nav şeqên wî re jê daliqiyan û li herduyên li pêşberî xwe, nerî. Lêvên wî zuwa û sipî bûbûn, xwîn ji wan çûbû. Hinekî li wan nerî, xwêziya xwe daqurtand û dû re serê xwe qederê çend saniyan dîsa xist ber xwe, dû re bêyî ko enîşkên xwe ji ser rahnê xwe rake, dîsa sûret bilind kir û lê nerî.
Xanimê û Sarê, bi awirên pirsyar lê dinerîn, bê sebir bûbûn. Diviyabû hin ji wan wê bêdengiyê rakin. Diviyabû Seîd tiştekî bibêje, lê nedigot. Tavilê Xanimê, »tu çi dikî kurê min, tu çima tiştekî nabêjî?« got.
Seîd ne ji dil beşişî û wek ko bixwaze bibêje »ma di zikê we de mirov dikare wilo bi hêsanî tiştekî bibêje« herdu milên xwe bi jêr û jor de hejand û berê xwe da hêla wê. Destê xwe dîsa avêt pişta stûyê xwe. Îcar destê xwe
siviktir li pişta stûyê xwe dibir û dianî û dixurand. Wek ko li wir, raman bi destan ji nav hevdu vediqetandin, dixwest a baştirîn hilbijêre û ji wan re eşkere bike. Lê ramana baştirîn nediket nav destên wî, girtina ramana baştirîn, her gavê ne hêsan e. Di derheqa tiştekî wilo girîng de, girtina ramana baştirîn, ji girtina Masadayê ne hêsantir e. Bi tirs û şik û xiroş bû. Di erê nayê de bû.
Seîd, sala berî wê lîse xelas kiribû û ji xwendinê betal mabû. Dema li

dibistanê bû, wî û yeke li dibistanê ji hevdu hez dikirin. Li hevdu kiribûn ko wê bizewicin. Lê rojekê gava hîna dor pênc mehan dibistan mabû, dît ko rûyê dildara wî buhustekê daliqandî ye û tê ba wî. Bêyî ko tu tiştên din bibêje, rû di rû de jê re »heger tu dê bê min bixwazî wer e, heger tu nayê, ez ê yekî din bikim, xelk tên min dixwazin« gotibû. Seîd şaş mabû, xwestibû jê re bibêje ko hîna ne gengaz e, qewlê me ne wilo bû, heta ko dibistan biqede, heta havînê, lê gotin bêxêr bûn. Dildara wî, »heta sê rojan, heger na, min ji bîra bike« gotibû û pişta xwe dabû Seîd. Piştî du rojan jî êdî nema qet hatibû dibistanê. Bi rastî jî yekî din kiribû. Ew yek, çend mehan ji bo wî bûbû sedema xemgîniyeke mezin. Ew kirina wê ya ji nifşkê ve û bêkeys, wek xapandin û bêbextî qebûl dikir. Pir li ber xwe

ketibû. Niha jî carnan ji bo wê bûyerê bêzar dibe, dixwaze ko serpêhatiyeke wilo tahl di jîna wî de tune ba, lê çûbû bûbû. Ji ber wê kirina wê ya bêkeys, dilê wî zû jê sar bûbû. Lê hîna dema bûyer nû bûbû, di bênhtengiyê de soz dabû ko wê bi tu Qamîşlokiyan re nezewice. Ji xwe re, »ma gelo qîzên vî bajarî hemû wilo bêbext in« gotibû. Tu bersiva ko bikaribe xwe pê dilxweş bike, ji wê pirsê re peyde nekiribû û soza xwe dabû. Ji ber wê yekê, li Qamîşlo, çavên xwe li tu kesan nedigerand û her ko pîra dêya wî jê re qala hinan dikir, kin lê dixist û dibirî. »Ew a han! Na min kes navê« digot. Xanimê û maliyên din bi wê serpêhatiya wî û wî derdê wî nizanîbûn û ji ber wê yekê jî, »Seîd bi tu kesan qaîl nabe« digotin.

Ji ber wê yeka tahl ko par hatibû serê wî, heger a ko wê navrojê pêşniyarî wî dikirin ne xuşka Sarê jî bûya, sedemên wî yên ko serê xwe ji bo yeke Nisêbînî biêşîne, bixwaze yeke ji wir ji xwe re wek jin hilbijêre

hebûn. Her demê Nisêbînî bi destan nediketin. Lê, dîsa jî ne hasan bû. Mirov nikare di derheqa tiştekî wilo de, dudilî nebe û baş nerame. Ji xwe re, »di sûret de baş xuya ye, lê dîsa jî hima wilo Erebî bazar nabe. Hemû kes di sûretan de xweşik xuya dikin. Dîtina bi çavan tiştekî din e« digot. Ji Xanimê re eşkere bû ko Gulê, a ko ew lê digerin e. Qîza nasan bû, xuşka sarê bû. Dixwest ko ew yek, ji bo lawê wê jî eşkere be... dixwest ko bi çavan bibîne û bi guhan bibihîze ko wî jî ew rastî diye û bibêje »baş e, herin bixwazin.« Lê hinekî jê piştkul bû, çend carên din di pêşniyarên xwe yên di vê derheqê de şkestibû. Ji ber wê yekê, bêsebir bûbû, nikarîbû bi bêhnfirehiyeke bêdawî xwe li bendî wî bigirta. Tavilê »tu çi dibêjî kurê min? Qîza nasan e û wek xezalekê ye. Ma tu dikarî bibêjî ko tu na ecibînî?« got, destê xwe bi aliyê sûret ve kir û »ma tu dê yeka wilo ji ko peyde bikî? Û mereva me ye. Heger tu bi a dêya xwe bikî, em ê ji te re bixwazin«.

»Dayê, ma hima wilo »em ê bixwazin« dibe! Min hîna ne diye û ne jî zanim bê navê wê çi ye!«

»Navê wê Gulê ye. Lê dîtin kurê min... Va te sûretê wê dît, ma ne spehî ye?«

»Yadê tu dizanî, ko min hezar caran gotiye a ko ez ê pê re bizewicim, divê ez bibînim. Rast e, a spehîbûnê, di sûret de pir spehî xuya ye. Lê dîsa jî

divê ez wê bibînim. Ya na, ev tişt qet nabe. Ev zewac e yadê, ji bo emrekî ye, ne wek tu tiştekî din e.«

»Ma tu diecibînî kurê min?«

»Min got... spehî ye, lê divê ez bibînim.«

»Ma ka em ê çawa bikin kurê min, dîtin ne hêsan e?«

»Nizanim! Ez li vir im û ew jî li wir e; lê dîsa jî hûn radibin me ji bo hev wek jin û mêr ditevsilînin û didrûn. Ez jî zanim ko ne hêsan e.« Destê xwe yê rastê ber bi herduyan ve vekir û »divê hûn bikaribin rêyekê ji bo wilo jî bibînin« got.
»Tu zanî çi kurê min! Pasewanekê ji bo çend rojan ji xwe re derxîn û her serxetê. Em ê ji birayê te re bibêjin, bila paswanekê ji te re derxe. Her bibîn û wer«.
»Wilo hêsan tu pasewanan nadin mirov yadê! Divê mirov sedemeke ber bi aqilan bibêje, divê bawer bikin ko hewcedariya mirov pê heye, ya na nadin mirov«.
»Xelk hemû derdixin, bi bertîlê derdixin kurê min. Ez ê bikim ko birê te peran bide. Ew malika ko mala wan li tenişta mala melê ye, ew malika Omerî... mala... (mala Simo, Sarê got) ha rehmet li dê û bavê te be... mala Simo, berî bi çend rojan çûn û hatin jî. Têra xwe rûn û şekir jî anîn, xwe xenê kirin. Çawa nabe?«
»Na yade, bila birê min ji bo wilo tu bertîlan nede. Paswan heqekî mirovan e, lê hemû bêbaviyan dikin û tu paswanan nadin mirov. Ew bi xwe bertîlxur in, lê divê em...«
»Na kurê min. Wilo nebêje. Tu kar bê bertîl nabin. Vê heyamê kesek belaş tiliya xwe di çavê kesekî din ranake. Ji xwe mamûr! Bertîl karê wan e. Ma nexwe mamûrên çi ne? Ev yek li min kurê min. Şuxlê te pê tune ye. Heger tu bi a dêya xwe bikî, tu ne li xisarê yî. Tu kes li bendî mirov namînim« got. Bi serpêhatiya wî ya li dibistanê nizanîbû, lê bi wê gotinê, ew ji cîhekî xedar birîndar kiribû. »Heger heta niha mabe, ji ber ko hîna zaro bû maye. Lê niha mezin e. Qîz wek fêkiyê di darê de ne. Heger ko gihan, tên çinîn.«
»Heger ko te ecibandibe, xem nake keko, xebera jinapa min e, em ê bikin ko Ebû Ferîd bide. Gulê nedîtî ye. Welehî ez texmîn nakim ko sal

di ser re here, wê xelk bên ji xwe re bibin. Xebîneta xezaleke wilo ko tu ji destên xwe berdî« Sarê got û xwe tev li gotinê kir.
»Erê kurê min, xebera Sarê ye. Xelk têrpere ne. Yeke bedew li ko hebe, dirin wê ji xwe re dixwazin. Xelk niha jinan dixwazin. Niha perên xelkê tên destê wan. Hin jê wek ko derkevin nêçîra xezalan, derdikevin ha li vir û ha li wir, ji lawên xwe re li qîzan digerin«.
Seîd tiştek negot û dîsa serê xwe berda ber xwe. Dîsa li sûretê ko hîna di

nav destên wî debû, nerî. »Dêya min nezan e, lê xebera wê ye, rast e. Mirov li vî welatî nikare berberiyê bi xerab û bertîlxuran re bike. Ne yek e, ne dudu ne, ne sê ne, ne çar in... biçûk û mezin hemû şirîkên hevdu ne. Gulê kevokek e. Gelekî spehî xuyaye. Mirov dil dikeve sûretê wê. Îcar ji bo dîtina wê ya rû di rû de, xortê ko bertîlan nede, li wî bajarî tune ne« ji xwe re got.
Xanimê tê derdixist ko di dilê xwe de ew pêşniyara wê jî qebûl kiriye û ser gotina xwe temam kir: »ev li min kurê min. Tu mitalan neke. Wê ni-ha birê te rabe, ez ê jê re bibêjim«.
»Wê pir kêfa Ebû Ferîd bê. Çi qase pere lê herin, wê neyên ber çavên wî. Tu nizanî bê çi qasî ji te hez dike. Ji mala bavê min jî hez dike. Min jê re negotiye, lê ez dizanim ko wê gelekî kêfa wî bê. Wextê te ye« Sarê got.
»Xwendina wê çawa ye Sarê, tiştek xwendiye?«
»Hinekî dereng dest bi xwendinê kiribû. Wê îsal heştan bixwîne. Pir şareze ye... pirtûkên li Nisêbînê hemû xwendine... tiştekî ko nizanê tune ye.«
»Welehî baş xwendiye«
»Erê kurê min«.

Dema gotin bi hevdu re nû wilo şêrîn kiribûn û dikirin ko şêrîntir bikin, dengê Ebû Ferîd hat. Li hewşê diçû û dihat û gazî Sarê dikir. »Ma ka hûn hemû ketinê ko, Sarê, ka were dismaleke mezin bide min, avê li destê min bike, ez fetisîm, zû«.
Sarê zû pê ve rabû û »ez hatim...« got. Nû çavên wê pê ketin »pek li vê talanê, tu di nav xwêdanê de fetisiye, tu çawa dikarî vê germê razî! Wax wax wax. Niha zarok jî fetisîne. Ez ê avê ji te re amade bikim, xwe tevî bişo. Ka raweste, ez ê niha amade bikim«. Sarê, bêyî ko li bendî bersiva wî
bimîne, dest bi amadekirina avê kir, ew xist serşokê, bi lez çû desmalek anî, bi bizmarekî nêzî destên wî ve daliqand û çû li zarokan nerî. Dît ko di xewê de ne û dîsa çû li ba Seîd û xesûya xwe rûnişt. Xanimê, ew û mala bavê wê dipesinandin, sûretê Gulê dipesinand û wî jî li dêya xwe guhdarî dikir.
»Bila serê xwe bişo, ez ê niha jê re bibêjim«.
»Na yadê, bihêlin ez derkevim û dû re. Ne hewar e. Piştî ez derkevim, ji nû ve jê re bibêjin. Hûn çawa li hevdu bikin, ez ê wek we bikim«.
»Xem nake kurê min, ma tu ji birê xwe fedî dikî, ma tu dê vê germê derkevî ku!«
»Na yadê, ez destê te maçî dikim li min negir... heta ez herim sebir bik«.

»Madem wilo dixwaze, bila wilo be jinapê, bila here û dû re«.
»Madem hûn herdu wilo baştir dibînin, bila wilo be. Piştî tu derkevî«.
Seîd rabû ser xwe, rahişt şal û gorên xwe û çû oda din, xwe guhert û di derî re derket. Pîra dê û Sarê jî çûn hêwana din, li bendî Ebû Ferîd rûniştin.
Nû Xanimê rûnişt, »ohnan! mirov bi carekê re tê derdixe ko vir ji

hêwana din hêniktir e. Ew der pir germ e« got û bi dawa xwe baweşînk li xwe kir.
»Erê jinapê, dinya pir germ e. Heta roj diqulipe aliyê din, ji derve ve li dîwaran dixe. Wir pir germ dibe. Xaniyên çemento havînan dibin wek firnê. Lê îro dinya jî pir germ e«.
Dinya hîna hênik nebûbû, hîna dema ko hin ji malên xwe derkevin ne-hatibû. Hîna agir di kuçan de bû. Wan çaxên rojan, kuçe vala bûn. Hew yek liban Ereb û serxetî li sûkan hebûn, lê li kuçên taxan mirov peyde nedibûn. Ji Seîd pê ve tu kes li kuçê tune bû. Bextê reş ko ba, ji hêla Sahra Ereban ve bû. Pêlên germa ko bi ber diketin û dihatin, wek şîşên sor li rûyê mirov diketin û diçûn. Carnan jî xwe di kuçê hildidan û radibûn, toz bi xwe re radikirin û diçûn. Ew xezeb, carnan jî li dora xwe difitilî, dibû babîsok û toz û tirabêlk radikir, li kuçê gurover dikir, dû re zirav dikir û bilind dikir. Di orta kuçê de tiştekî wek stûneke mezin ji tozê avadikir û bi xwe re dibir. Bi xwe re dibir ezmên, li wir ewrek ava dikir. Ji ber wê yekê ji nîro pê ve ezmanê ser bajêr reng girik bû. Xwe dida ber dîwaran, di ber siyê re dimeşiya. Lê li tu deran siyeke baş tune bû. Roj, hî-na jî ji jor ve bû. Xwedê rîha bavê wî sitirand ko dera berê wî lê bû, ne pir dûr bû. Li kuçê difitilî, li serê kuça din mala komunîstekî din hebû. Jê re, Siloyê mala Simbêlsoran dihat gotin. Wê navrojê çû xwe avet bextê wî! Ew ji xewê rakir: »rabe ser xwe, rabe Silo... ev çi halê te ye... tu ji sibê heta
êvarê ji xelkê re şiyar bibin dibêjî û tu bi xwe tê radizê. De rabe ser xwe«. Silo bi çavên nîvvekirî bi zexelî û alîkariya destan rabû û »tu îro dîn bûyî, çi bûye. Malxerab ma kî vê germê ji mala xwe derdikeve? Gelo romiyan girtibû ser we, çi bûbû« got.
»Welehî îro sebra min nehat, de ka rab ji me re hinekî biaxiv, rab... ma çi ji xewê derdikeve« got û rûnişt. Gotin ji siyaseta Yekîtiya Sovyetan, ji

gotinên Brejnev vekirin û birin ser dinyê tevî. Gelek tiştên ko barê wan bi xwe bûn, diviyabû pê biaxivin û çareser bikin li dinyê hebûn. Lê hişê wî her li malê bû.
Gava Ebû Ferîd hat hêwanê, hîna jî dismala xwe di serê xwe û pişta

stûyê xwe dida. Hêsaniya ko bi şuştinê re ketibû bedena wî, xuya dikir. Xanimê ew li ba xwe da rûniştin û weziyet jê re rave kir û got. Wê bi xwe, biryara xwe dabû û berî ko li bendî bersiva wî bimîne, derxistina paswanê û wezîfeyên wî yên din di wê derheqê de anîn bîra wî. Bi taybetî anî bîra wî ko birayê mezin e, gelek bar dikevin ser milên wî bi xwe û »divê dereng nemînin. Xelkê mûsimê xwe hilanîne, perên wan di paşilên wan de ne û li vî alî û wî alî li qîzan digerin, xortên xwe dizewicînin. Di van deh rojên dawî de çar qîz ji vê taxê bi xwe birine û sêyên din jî xwestine. Bêguman niha li serxetê jî wext e. Berî ko ji destê me here, divê em qudûman bidin ber xwe û serê wê girêbidin. Ji bo ko xelk bizanibin û xwe jê vegirin« got.
Ebû Ferîd bi bihîstina wê yekê re, wek Seîd şaş nebû, lê dîsa jî xuya dibû ko ew jî wê gavê ne li bendî tiştekî wilo bû. Germê, hîna xwe berî hemû tiştan dianî bîra wî. Bêdeng guhdarî dikir û geh li dêya xwe, geh jî li Sarê dinerî. Gava Ebû Ferîd li Sarê dinerî, wê xwe hinekî diqijiland, xwe biçûçik dikir û awira xwe ji a wî derdixist. Ebû Ferîd zanîbû ko ew yek ji bin serê wê derketiye. Wê jî ev kirin bi lebata xwe, li xwe dida der.
Tavilê Ebû Ferîd »baş e, ser xêrê be« got. »Çi ji destê min bê, ez ê bikim. Êdî wextê Seîd e. A ko hûn qala wê dikin, dişa min e. Ev ji bo min bexti-yariyeke mezintir e«.
Gava Ebû Ferîd wilo got, rengê bextiyariyê di rûyê Sarê re xuya bû. Hinarkên wê hêdî hêdî sortir bûn, lêvên wê qalintir û bixwîn û bigoştir

bûn. Bi dilgeşî li mêrê xwe dinerî û pê serbilind dibû. Dixwest ko tiştekî jê bixwaze... li bendî bû... wê bîstikê gelekî dixwest ko jê re xizmetekê bike. Hima çi bûya.
Lê »ma Seîd çi dibêje, ma we jê pirsiye?« berê xwe da dêya xwe û got.
»Me jê pirsî kurê min... hûn zanin got me«.
Ebû Ferîd li Sarê fitilî û jê pirsî, »ma Gulê wilo mezin bûye?«
Wek her demê, bedena wê hemû bi pirsa wî re şiyar bû û got »erê weleh, êdî jin e, gihaye. Û çiqasî spêhî ye. Xwedê bisitirîne, wek çinarekê ye. Ne tu bîbînî Ebû Ferîd, serê wê digihije jora derî, hima bibêje wek min e«.
Dilê wê tê de hebû ko Gulê hinekî din jî bi pesinîne, lê Xanimê gotin ji devê wê girt. »Lê Seîd heta ez nebînim, nabe dibêje. Em ê wek wî bikin. Divê tu di van çend rojan de pasewanê jê re derxî. Bila here serxetê, wê bibîne û vegere. Divê em dereng nemînin. ko qîz mezin dibin, dibin wek fêkiyê di dareke ber rê de, xwazgîniyên wan pir dibin«.
»Baş e. Dîtin, xebera wî ye, bila hevdu bibînin. Dostekî min heye, di

hukûmetê de xurt e, ez ê jê tika bikim, min naşikîne. Do li ba min bû. Çi pere lê herin, ez ê bidim. Ez ê bikim ko zû çêbike« Ebû Ferîd got û bêyî ko gotina xwe bibire, dîsa fitilî ser Sarê û »ma te li ber guhên dê û bavê xwe jî xistiye Sarê«.
»Na weleh. Min îro ji jinapa xwe re gotiye û hew.«
»Te baş kiriye«.
»Min xwest ez pêşî ji we re bibêjim« bi serbilindî got.
Xanimê sûretê Gulê ji paşila xwe derxist, pêşî, dîsa wê bi xwe hinekî lê nerî, pesinand û dû re jî da destê wî û »tu ka lê binere kurê min. Xwedê bisitirîne, wek hîvê ye« got.

Ebû Ferîd rahişt sûret û lê nerî. Bi serê xwe rastiya gotina wê diyar kir. Dû re got »wilo ye, xwedê bisitirîne, delal xuyaye. Ez ê di çend rojan de pasewanê çareser bikim. Lê ma tu ji bavê min re nabêjî? Divê bizanibe bê em dixwazin çi bikin. Heger ko em wî zû pê nehisînin, wê pir li ber xwe keve. Ez dixwazim berî ko em tiştinan bikin, em jê re bibêjin û guhdar bikin bê ka ew çi dibêje«.
»Ez ê îşev jê re bibêjim kurê min. Ji xwe ma wê rebeno çi bibêje, destên xwe ji kar û barên dinyê kişandine. Lê xebera te ye, divê em wî zû bi mexseda dilê xwe bihisînin. Ez ê êvarê jê re bibêjim«.
Wilo li hevdu kirin û serast kirin. Tiştekî ko diviyabû bikin û ne fikirîbûn, nema bû. Tiştê ko mabû, hew wê kalê bavê malê pê bihisandina û gotina destûra wî jê bigirtina. Ew jî êvarê...
***
Esir bû. Sî dadigeriya devê çeman, best û newalan û kuçe û meydanên bajaran. Bêhna avê û daran ji hêla barajê ve diket ber bê û hêdî hêdî bi ser
bajêr de dihat. Germa kamax şkestibû. Lebat ketibû xelkê, diçûn çar aliyan û li hev digeriyan. Çûk derdiketin nêçîra piştî nîro a dawî. Zarok ji bo lîstikê derdiketin kuçan. Qîz derdiketin ser xaniyan, ber deriyan û xort derdiketin tolaziyan.
Sêvê, şevbuhêrkên êvaran û hatina ji bo firavînên xweş ne tê de, piştî bûkaniya xwe, cara sêyem bû ko dihat serdana mala bavê xwe a qet nebe ji bo şevekê û du rojan. Dor mehekê çebûbû ko gihabû Xalitê Kevanan. Dor bêriyan Xalit hatibû ew danîbû mala bavê wê û ew bi xwe çûbû bajêr. Li Sêvê xuya dibû ko jîna wê ya nû lê hatiye û dilgeş e. Bûbû wek rihana ko di hênikaya dahnê êvarê de nû bê avdan. Reng û hilm û bêhn jê difûriyan. Êdî can û jînê di bin çermê wê yê teze de diçirisandin. Ji xwe kincên wê yên spehî û zêrên di stûyê wê û di destên wê de, spehîbûneke

cuda didanê. Xemla bûkaniyê, li qîzên ba me, wek spehîbûna ko gulên daran didin daran e. Çav her dixwazin wan bibînin û dilan bi spehîbûna wan geş bikin. Dewlemendiya wê bênhfirehiya ko bi zewacê re di bedena wê de peyde bûbû, îcar eşkeretir bûbû. Hêdîtir radibû û rûdinişt, hêdîtir diaxivî û bi giramgirî guhdarî dikir. Kenê wê... ji xwe ew jî êdî wek ê mezinan pir bi aqilî bû û pir ji dil bû. Dilovaniya ko bi razîbûna ji jîna xwe bidest xistibû, di gotinên wê û lebata wê de pirtir û eşkeretir bûbû. Rengê rûyê wê xweştir bûbû û xwêya pîrekî bêtir tê re xuya dikir; hinarkên wê sortir bûbûn û lêvên wê qalindtir bûbûn. Xuya dibû ko hedanî û xweşiyeke bêhempa ketibû bedena wê û tê de mabû. Bextiyarî jê difûriya. Xalit gelek xweşî û pîrekî anîbû bîra wê, ew fêr kiribû û wê bi xwe jî, hemû, bi pûteyî di bedena xwe de hûnabû. Gava Gulê ew wilo hêsan, bextiyar û dilgeş didît, dilê wê gelekî dibijiya bûkaniyê. Ji xwe re »gelo rojek heye ko ez jî...«

Tavilê Sêvê, bi wê bextiyarî û hêsaniya ko piştî ragirtina azweriya temenê ciwan... a rastî bi wê aşî û hedaniya dilgeş a ko hew dikare bi zewacê di bedena qîzên ba me de peyde bibe, rabû, xwe hinekî bi qapanî li ba kir û çû aşxanê. Bi rê de »mirov çi tî dibe« got û hinekî beşişî. Gulê xwe negirt, rabû û da dû. Dîsa kirasê wê yê sor yê hevrêşim lê bû, bi dû de lerizî û lîst. Bêyî ko axavtinê bi tu peyvên din veke û lê bifitile, ji Sêvê pirsî bê ma zewac xweş e, tiştekî çawa ye. Sêvê, bi awayekî bêşik »pir xweş

e xuşkê« got û bi dilgeşî beşişî û wek yeke mêvan, bi awayekî ne ewle li dora xwe nerî. Wek ko ew aşxane baş nasnedikir, nerî. Êdî bi lebata xwe dida der ko ne yeke ji malê ye, mêvan e û li mala xwe pir dilgeş e, jîn li

mala wê pir xweştir e.
Stiyê, ji xwe bi xwe re »ez ê dereng bikevim« got û rabû çû aşxanê; dît ko Gulê û Sêvê bi dilê bextiyar bi hevdu re diaxivin û dibeşişin. Dilê wê hat givaştin. Ên wê yên din hatin bîra wê. »Mala min şewitî, niha xuşkên we yên din jî li malê bûna wê çi xweş bûya. Medîna reben ji kengî ve nehatiye. Nehat Sarê jî nedît. Qet neba gerek bikarîba bihata daweta Sêva min. Bextê min ê reş ko qîzên min wilo dûrî min ketin, hew Sêva min tenê li ba min ma« got û bi hezkirin û dilovanî destê xwe di ser rûyê wê yê teze re bir û anî û pê re beşişî û »maşeleh Sêva min bûye wek gilokeke rengîn, wek guleke buharê... xwedê te ji çavan bisitirîne keça min« got. Gulê xwe avêt nav axavtinê û bi kenekî nîvşermokî, lê bi bextiyarî, »ez bi xwe jî, ez ê dûr nekevim... ez soza xwedê didim dêya xwe... ez ê nêzîkî dêya xwe bimînim û ez ê dûr neçim« got û xwe nêzîkî destê dêya xwe kir.
110 SORÊ GULÊ

Dixwest ko wê jî bifirkîne, bi wê jî şa bibe. Ji ber nîv xiroşa ko girtibû bedena wê, bêdeng bû, lê diranên wê di devê wê de sipî dikirin, dibeşişî. Dixwest ko rastiyeke sedema kêfxweşiyê di gotina wê de bibîne û pê şa bibe. Sêvê bi nazdarî xwe nêzîkî dêya xwe kir û »ma tu dizanî yadê... Gula me jî ji xwe re yek diye, xortekî baş e û pir şêrîn e, herduyan li ser hevdu ruh û can avêtine« got. Gulê li hember gotina wê derneket, lê bi awayekî nivşermok xwe hinekî din jî bi ser dêya xwe de tewand.
Stiyê, hinekî bi şik, wek ko bibêje »adet e, divê ew û hin hevdu bibînin« li wan nerî, lê dîsa jî pir guh neda wê gotinê, hew bi dilovanî pê re beşişî û »xwedê te bisitirîne keça min. Xwedê yekî li gor dilê te bike para te û nesîbê te li cîhekî dûr nexe. Tu dibînî, Sara reben çû heta nav dewleteke din, xwezî ew jî li vir bûya! Gelo niha çi dike!« got. Lê, ne dereng lerz û zinginiya dêngê peyva »Gulê jî ji xwe re yek diye, herduyan li ser hevdu

ruh û can avêtine« ji guhên wê çû ser mejiyê wê. Hat bîra wê ko divê dê, bi tiştên qîzan ên wilo bihisin û wan ji her babet xeterên di wê derheqê de
biparêzin. Ciwan û nezan in, heger bi nav de herin, hetiketiya dinyê ye! Ji bo tedbîra ko tu hetîketî neyên serê wan, divê bi gotinê bala qîzê bide kirinên wê. Du dilî bû. Diviyabû çi bike û çi neke. Him ne qebhet bû ko mirov û hin hevdu bibînin û him jî xeterek di wê kirinê de hebû. A dawî a ji bo wê rast bû. Wilo bawer dikir. Heger îcar bi dû re tiştek bihata serê qîzê, wê xwe çawa ji nav lepên Hecî Elî xelas bikira. Îfade ji tiştên wilo re tune bûn! Hat bîra wê ko dê, berpirsyarên tiştên ko dikarin bên serê qîzan in. Divê bikaribin berî ko bibin, bibînin. Tavilê dîsa berê xwe da Gulê û bêyî ko ew bi xwe ji gotina xwe bawer bike »te kî diye Gulê, bi xortên xelkê re nekeve tu bazaran. Welehî heger bavê te bibihîze, wê qeziyên te jêbike. Bila tu kirinên te yên wilo nekevin ser zimanê xelkê, em ê bi-hetikin«.
Gulê, hinekî bi şermokî »yadê me...« got, lê Sêvê nehişt ko ji wilo bêtir bibêje. Wê bi xwe gotin girt. »Tiştekî ko hinek pê bihetikin nebûye. Ma min û Xalit hevdu dît, hûn hetikîn. Ma ne hemû tişt bi serbilindî bûn. Êdî wext wilo dixwaze yadê. Gulê diçe dibistanê, bi sedan xortên spehî jî li wir hene. Ma heger ew û yek ji wan hevdu biecibînin ne baş e«.
Stiyê »keça min xelk...« got lê Sêvê gotina wê birî.
»Him qîz û him jî xortên xelkê jî wilo dikin. Ez dizanim bê qîzên xelkê jî çawa bi dû xortan dikevin û diçin civanên wan. Lê ên xwe ji bîra dikin û paşgotiniya ên xelkê dikin. Lê qîzên te, te qet fedîkar dernaxin yadê, dil-safî û ewle be. Ma min û Xalit hûn fedîkar derxistin? Ma ne min û wî hev-

du dît? Gulê jî wek min e. Yekî baş ji xwe re diye. Min jî ew diyê, ez wî nas dikim, xortekî bedew e« got û milê Stiyê hinekî firkand. Aş bûbû. Sêvê ew razî kiribû. Gulê bi awiran kêfxweşiya xwe ji Sêvê re diyar dikir. Tavilê Sêvê, »te qala Sarê dikir yadê« got û mijara axavtinê guhert. »Erê welehî... min qala Sarê dikir keça min... ew çû dewleteke din. Em hevdu bi salan nabînin. Nizanim bê niha çi dike«.

***

Êvarê, hîna berî şîvê, malbata Şemê dîsa li hevdu civiya. Tu kesên kêm tune bûn. Êvareke xweş bi dû rojeke dijwar de hatibû. Kêm caran wilo dibû. Êdî ew bayê navrojê haş bûbû, toz û tirabêlk ji ser bajêr çûbû û dinya hênik bûbû. Wê êvarê, bêhna dar û bexçan, av û êvarên çiyan û axa hênik ji hêla serxetê bi hewayê ketibû û bi ser Qamîşlokê de difûriya. Çendak bû, ko bêhna şewatê di hewa herdu bajaran de bû. Cendirman dîsa agir berdabûn pûş û pelaxê nav maînan û bêhneke tûj bi hewê xistibûn. Her salê ji bo ko starê û mecala xweveşartinê nede tu kesan, wi-lo dikirin. Lê wê êvarê êdî bêhna dinyayê xweştir bû. Ne ji bo mirovan tenê wilo bû. Xuya ye heywan û kêzik baştir pê dizanin. Ji ber ko bêhna şewatê tirsa mirinê dide wan. Ew jî wan çend rojan bêdeng bûbûn. Lê wê êvarê çend çirçirkan li pişt xênî, dest pê kiribûn û di nav her babet den-gan re, dengê xwe bilind û zîz dikirin û malên dor hêlê hemû bi xwe di-hisandin. Çûk ji nêçîra piştî nîro vegeriyabûn û li ser herdu tûyan bi bex-tiyarî dixwendin û diqîjiyan. Carnan, kifş dibû ko hin ji wan pevçûnan li ser cîhê ko wê şevê lê bibuhêrin dikin. Divê şaxê her yekî ji wan kifş be û xwe lê ragire, lê ew jî carnan wek me mirovan tên û hevdu derdikin û dikevin dewsa hevdu. Lê ew şerê wan bi xwe, pir nakişînê. Heta ko şev tarî dibe û reş dikeve erdê, hemû nakokiyên di nav xwe de çareser dikin û bêdeng û aram li cîhê xwe radiwestin. Sibê, dîsa yek celeb in, bê pêvçûn dest bi rojê û nêçîrê dikin. Qijaka bêhnteng, êdî bêdeng bûbû, pêjina wê

ji tu deran nedihat. Dengê pevçûnê ji mala Çolo dihat. Dengê gazin û giriyê wan û ê zarokan tev hev dibû. Xuya bû ko li herdu jinên xwe dix-ist.
Sarê dest bi karê anîna şîvê kiribû. Wek dema kevanî rojên şahiyan dikin, dipekiya bi vir de û bi wir de. Bi kêf bû, beşişandineke şermok li ser dev û lêvên wê bû. Seîd li tenişta bavê xwe bû, hinekî bi raman û bi mitale bû. Gelek tiştên ko tê biramiya hebûn. Lê wê êvarê, mereqa bê
112 SORÊ GULÊ

Gulê qîzeke çawa ye, bi çi raman û bi çi zahrî ye, daketibû ser mejiyê wî û ew mijûl dikir. Xuya dibû ko serê xwe bi bûyerê baş diêşîne û ko di wê derheqê de, ji malbatê hinekî şerm jî dike. Zanîbû ko wê ev qal û bahs îcar li nav malbatê vebe û bigere. Gava biaxivin, wê carê hin ji wan awira xwe ji ser hevdu bibin, wek ko bibêjin »ev şêwir hemû ji bo te ye« û di bin
çavan re li wî binerin. Her ko lê binerin, ew ê fedî bike û serê xwe têxe ber
xwe. Tiştekî ko bigota jî tune bû. Wî, a xwe gotibû. Hew divê êdî guhdar bike û xwêdanê ji xwe zuwa bike. Digiha baweriya ko rewşeke wilo, ne rewşeke ko mirovên biaqil pê qaîl bibin e.
Seîd wê êvarê wilo kir. Kevçî ji devê wî de ket ne ket, »li min bibuhurin, weleh karekî min heye, divê ez herim« got û da xwe. Hiso »tu zanî kurê min, oxir be« got. Lê ên ko mesele zanîbûn, zanîbûn bê ji bo çi wilo ecele kir û çû. Bê deng bi dû wî de nerîn û beşişîn.
Piştî şîvê, gava êdî bû çaxê rûniştinê û paldan û axavtinê, gava dor hat şêwran, biryaran û lihevduragirtinê, malbat wek her êvarê hêdî hêdî hilk-işiya nav hênikayiya ser xênî, cîhê şevbuhêrkê û rûniştinê.
Bayekî nerm û hênik û bêhnxweş ji hêla serxetê dihat û diherikî ber bi

taxên başûr de. Lerzeke dengxweş ketibû pelên herdu tûyan. Wê êvarê, şevbuherkên ser xaniyan xweş bûn. Ji dermanan re jî pêşî tune bûn. Li taxa jêra wan dengê amadekariya li darxistina dîlanê dihat. Li taxa jêrtir, Seîd Ûsif dîlan gerandibû. Ji hewşa mala Çolo hîna jî kaz kaza herdu jin û zarokên wî dihat. Ji radîoya wî kifş dibû ko ew bi xwe li ser xênî bû, li deverinan digeriya, di ser îstasyonên cuda re diçû û dihat, lê a xwe peyde nedikir. Carê di navnan re dengê xwe li wan hildida û »de bes e... ez ê dîsa
bêm we ha« digot û disa digeriya. Hiso dît ko mêvanên mala Birkê hene, hîna şîv dixwarin. Ji her hawên wan dihat famkirin ko serxetî ne.
»Mêvanên te bixêrê hatine Birkê, afiyet be ji we re« Hiso got.
»Xêra xwedê li te be Hiso. Pismamên min in, ji jor in«.
Hiso, »de baş e, xwedê bi wan re be« got, li ser doşekê rûnişt û li hewê ponijî. Piştî bêhnekê, »îşev ser xaniyan xweş e« got.
Ebû Ferîd û Xanimê herduyan bi hevdu re »erê welehî, dinya hênik e, wek êvareke payîzê ye« gotin.
Hiso, »bêhneke xweş ketiye hewê« got û cîhê xwe xweş kir.
Xanimê cîhê xwe li pêşberî wî xweş kir û mesele jê re vekir. Mexseda dilê xwe û malbatê ji serî ve jê re got û eşkere kir. Kêfeke nerm girt ser rûyê wî. Qermîçonkên di rûyê wî de, bi kenê kêfa ko girtibû rûyê wî, ber bi hevdu de dihatin û nav wan kûrtir û reştir dikir. Serê xwe dihejand û

guhdarî dikir. Piştî ko Xanimê gotina xwe got, dor hat wî û li Ebû Ferîd fitilî: »ma tu çi dibêjî kurê min?« got.
»Gotina dawî a te ye yabo. Tu çawa bibêjî, em ê wilo bikin.«
»Ma hûn berê neaxivîne?«

»Belê welehî. Îro navrojê ji min re gotin, min jî got baş e, lê em ê ji bavê min bipirsin. Ji ber vê yekê, em bi te dişêwirin. Tu çi bibêjî, em ê wek te bikin.«
Wê bîstikê, Sarê bi termosê ava sar hat ser xênî. Termos danî ortê, nêzîkî destê Ebû Ferîd û xwe li tenişta Xanimê, hêdîka berda erdê. Hiso, bêyî ko biaxive, destê xwe ber bi avê de dirêj kir û av xwest. Ebû Ferîd tasek jê re dagirt û da destê wî. Bi ser xwe dakir û keserek veda. Qewet û
desthilata wî ya berê hat bîra wî. Tê derdixist ko êdî hemû çûye heliya ye, bi salan re hilweşiya ye. Lê xwe zû da ser hevdu, hat bîra wî ko tu kesan destên xwe dirêjî desthilata wî nekiriye, wî bi xwe, ji ber xwe ve berdaye û got »kurê min, ji bo ko tu bi min dişêwirî, xwedê karê te li hev rast bîne. Lê tu zanî ko ez mezin bûme, min karên dinyê hemû sipartine te. Lê heger gotina min ji we re pêwîst e, hûn li hevdu bikin, ez jî bi we re. Hûn çi rêyê bidin ber min û xwe, ez ê wek we bikim. Hecî Elî di wextê xwe de wek birayekî min bû. Ez pir jê hez dikim. Tu birayên min tune bûn, lê piştî ko min û Hecî Elî hevdu nas kir, min zanîbû ko êdî ez ne tenê me. Wek birayê min ê biçûk bû. Xwedê dizanê ko ez jî birayê wî yê mezin bûm, min wilo jê hez dikir. Ji xwe piştî ko Sarê bû bûka me û em bûn merevên hevdu, her ko ez radibim û rûdinim, ez duan ji wan re dikim. (Sarê bi dengekî nizm got »xwedê ji te razî be apo«). Em tu caran lê poş-man nebûne. Wek desmaleke ser destan e. Qîza camêran e, serê me ji ber
bilind e. (»tu ji camêriya xwe dibêjî apo« Sarê di ber axavtina wî re got) Tiştê ko em hemû dixwazin, ko bûkeke me ya din jî wilo hebe ye. Bifikirin ko niha bêbaveke rûşuştî di vê malêde bûya, bê wê halê me çi hal
bûya. Na gidî na! Xwedê mirov ji bûkên xerab bisitirîne, xwedê mere-

vantiya mirov bi bêbavan re li dar nexe. We vê evarê pir kêfa min anî. Heger hûn ji min dipirsin, ev yek her li pêşiya me ye. Îcar xwe sist nekin û tiştê ko Hecî bibêje, wek wî bikin, texsîr nekin. Lê ma Seîd çi dibêje?«
»Dêya min îro navrojê jê re gotibû, bi kêfa wî bû.«
»Madem wilo ye texsîr nekin kurê min, gelekî baş e.«
»Baş e yabo. Madem bi kêfa te jî ye, çi lazim be ez ê bikim.«
»Bike kurê min, bike, texsîr neke.«
Ebû Ferîd, »baş e yabo, tu mereqan nexwe« got û li zarokan fitilî »hûn

nerin li derve bi zimanê xwe nexelitin û ji xelkê re nebêjin ha.«
Herduyan bi hevdu re »na yabo ez nabêjim« gotin.
Xanimê jî xwe avêt nav û got »erê welehî. Ka heta em binerin bê xwedê çawa dike. Piştî ko me bi rastî xwest, hûn karin bibêjin«.
Wilo li hevdu kirin. Şevbuhêrka xwe hemû bi axavtin û şêwira di wê derheqê de buhartin. Kêfxweşiyeke bêdawî ketibû dilê wan. Di ser û binê axavtina xwe de, Hecî Elî û Stiya kevaniya wî dipesinandin, Sarê dipesinandin û cîh di dilê xwe de nedidan tu şikan ko wê bûka wan a nû jî, ne yeke wek wê be. Heger ko kihêleke wek Sarê bûka mirov be, mirov dê bixwaze ko sed bûkên mirov ên din jî wek wê hebin.
Sarê bi serbilindî guhdarî dikir. Gelekî bextiyar bûbû, dilgeş bûbû. Rojên ko dil bi bextiyariyê dagirtîne, merdî, dilovanî û hêvî jî di dilan de bê dawî ne. Geh radibû tirî dianî, geh şebeş hûrdikir û dianî û geh jî petêx dianî. Dixwest tiştên di malê de, hemûyan wê şevê pêşkêşî malbatê bike. Mala Şemê wê êvarê gelek tişt ji hevdu re gotin, lê hemû tiştên ko dixwestin ji hevdu re bibêjin, dîsa jî xelas nekirin. Ji bo razanê ji ber hevdu rabûn. Seîd jî wî çaxî hat. Êdî şêwir belav bûbû, malbat hêdî hêdî diçû ser nivînan. Dengê Ebû Ferîd ji nav nivînan hat: »Seîd, heger tu sibe dor

bêriyan bê dikanê tu dê baş bikî. Hinek karê min ji bo wê meselê heye, ez ê saetekê duduyan derkevim, divê tu li ber dikanê bî« got.
»Baş e, ez ê sibe bêm«.
Xanimê xwe ji nav nivînên xwe tev li axavtinê kir: »erê kurê min erê, sibe karê birê te heye, tu here wir, heta ew vegere, tu li ber dikanê be«.
»Baş e yadê. Heger ez di xewê de bimînim, min rake«.
»Baş e kurê min, baş e, ez ê te rakim«.
»De xwedê rehetiyê bide we hemûyan, heta sibehê xwedê mezin e«
Hiso ji aliyê din got û bêdengiya razanê di nav malbatê de ava kir.
Roja din, wek ko li hevdu kiribûn, nebû. Silo, Seîd hinekî dereng xist. Incex berî nîro çû giha ba Ebû Ferîd. Hima çû neçû, ew ji bo karê paswanê derket, çû.
Ebû Ferîd li daîrên hukûmetê gelek nasnedikirin, lê dostekî wî yê ko her kar ji destên wî dihatin hebû. Yekî Helebî bû. Navê wî Ebû Merwan bû. Bi munasebeta ko Ebû Ferîd carê diçû mal ji dikana birayê wî dikirî, ew nas kiribû. Hîna berî bi çar salan bû, rojekê gava li dikana birayê wî mal dida ser hevdu, birayê wî hatibû jê pirsîbû bê ma ji ko ye. Gava »ez ji Qamîşlo me« gotibû, mêrikê xort, »bi heqê xwedê min zanîbû tu ji wir î. Kifş e ko tu ji wir î. Birayê min ê mezin jî li wir e, ez ê kaxetekê bidim te,

here ba wî, hevdu nas bikin, belkî rojekê karên te li ba wî derkevin û ji te re lazim bibe« gotibû.
Ebû Ferîd bi a wî kiribû û dema vegeriyabû malê, rojekê çûbû ba birayê wî. Gava ew dîtibû, ji çavên xwe bawer nekiribû. Ser milên wî tije stêrik bûn. »Bavo ev mirovekî pir mezin e, heger dostekî mirov ê wilo hebe, piş-ta mirov li tahtê ye« ji xwe bi xwe re gotibû.

Ji wê rojê ve dostên hev in. Ebû Ferîd bêyî wî naçe Helebê. Diçe li tembî û qewîtiyên wî dipirse. Silav û kelamên wî dibe. Her carê, ji bo ko ji bêgavî rêya xwe bi dikana birayê wî bixe, nameyekê jî pê re rê dike. Bi kêfxweşî dibe. Û çi gava ko birayê wî li Helebê namê vedike û dixwîne, jê re, »Ebû Merwan tembiya ko ez malê baş û erzan bidim te kiriye« dibêje. Bi dû re jî, wek her carê, ji bo ko dîsa negotî nemîne, »ehlen we sehlen ya
muhterem, ya Ebû Ferîd« dibêje.
Rîtualên dostaniya wan, wilo pirhêl û bi çiv û manê bûn. Ebû Merwan hostê lidarxistina her babet kar û pêwendî û dostaniyan bû. Ji wê roja pêşî
ve çi dema ko karên Ebû Ferîd diketin aliyê hukumetê, pêşî diçû ba wî. Çend carên din jî gava karên wî yên wilo ketibûn aliyê wî, qet texsîr nekiribû. Ên li ber destên wî û di bin wî re, kaxetên wî ji destên hevdu revandibûn û gerandibûn. Di dema ko gotibû de xelas kiribûn û dabûn destê wî. Ji ber wê yekê, Ebû Ferîd di derheqa karê paswanê de bêxem bû.
Karekî wek karê derxistina paswanekê, ji bo Ebû Merwan, wek vexwarina gulpeke ava sar hêsan bû.
Ebû Ferîd rast çû ba Ebû Merwan. Li hêwana mezin lê pirsî. Ebû
Nezîrê ber destan, »li cîhê xwe rûniştiye, welehî şensê te heye, niha nû hat
rûnişt« got û da pêşiya wî. Dema Ebû Merwan ew dît, xêrhatineke germ lê kir û cîhê rûniştinê şanî wî kir. Piştî lihevdupirsîneke kurt, dema Ebû Ferîd jê re eşkere kir bê ji bo çi karî hatiye, »ser serê min û ser çavên min. Xizmetkarî ji muhteremekî wek te re şeref e, tu çaya xwe vexwe û here karê xwe. Ez karê te dimeşînim û dû re li te digerim. Îro çû, lê hefteya ko bê, ebeden«.

Ebû Ferîd, »xwedê karê te rast bike. Lê carê dema tu vala bibî, serekî bide min. Heger hewcedariyeke te derkeve û tu neyê ba min, dostaniya min û te xelas dibe ha!« got û rabû ser xwe.
»Ebeden, Ebû Ferîd, ma em dostên hevdu ên çi ne!«
Ebû Ferîd li pêyan, bi dostanî lê dinerî û bi bextiyarî dibeşişî... Dû re destê wî hişk girt û hejand, »de bi xatirê te Ebû Merwan... lê bike ko tu me zû bi rê bikî, heyrana çavên te«.
116 SORÊ GULÊ

»Ebeden, Ebû Ferîd, tu mereqan nexwe, îro çû, lê hefteya ko bê, ebeden.«
»De bi xatirê te Ebû Merwan.«
»Oxir be.«
Ebû Ferîd piştrast çû malê. Rewşa kar ji maliyan re got. Bi bawerî û hêvî bû. Heçê Ebû Merwan bû, karîbû hemû tiştan bike. Karîbû şîrê şêr di eyarê şêr de bîne.
Dor deh salên wî li Qamîşlokê çêbûbûn û gelek dostên wî yên wek Ebû Ferîd hebûn. Di wan deh salan de, ew û xelkê wir bi hevdu re ketibûn nav bazar û pêwendiyên ecêb û pirhêl. Dînê wî pere bûn, îmana wî pere bûn. Hemû dan û stendinên wî li ser peran bûn. Bertîlxurekî di ser wî re li dinyê tevî tune bû. Tu kesê ko bertîl nedabû wî, tune bû. Lê, hatiniya wî jî bi qasî pêwendiyên wî pirhêl û ji gelek tiştan bû. Heta par pêrar jî, ji tûtinê bigirin heta bi fîşekan û Dolaran bi hosteyiyeke mezin û bêdeng difirotin kesên »saxlem.« Lê tiştên ne pir bi xeter, hîna jî dikirin. Tirimpêla wî wek servisa wan karan bû.
Pişta Ebû Ferîd jê rast bû. Çi bûbûya nebûya, wê Ebû Merwan karê wî bimeşanda û Seîd rêbikira Nisêbînê. Wilo soz dabû.
***

Nisêbînê li ber kelê bû. Bajar, li ser rojana tevrikê, hêdî hêdî dibû du beş û diketin ber hevdu. Xwe ji şerekî mezin re kar dikirin. Mereqeke mezin ketibû dilê hemû kesan û li bendî rojan bûn. Hin jê jî bi hêviyên mezin radibûn. Ên ko pir nûhatî bûn, hêviya ko wê Nisêbînê bibe cîhê çirûska pêşî ko wê şoreşa welêt li dar bixe dikirin.
Ji roja yekşemê pê ve, Serdar nema diçû tevrikê. Deh rojan li ser havdu, bi du çawîşên cuda re çûbû. Wilo li hevdu kiribûn. Her ji çend xwendevanan bi yekî re diçûn. Gihabûn ko topa palan li karawestandinê sor bikin, êdî hemû amade bûn. Mabû organîzekirina karên pratîk. Êdî ew jî bi karên organîzekirina rawestandina tevrikê a pratîk dadiket. Seranserê rojan di civînan de bû, di nav şêwir û biryaran de bû.
Êvara çarşemê, Misto, wek ko wî û Serdar bi rojê li hevdu kiribûn, di wextê xwe de çû mala wan. Hîna saet heft û tiştekî bêxêr bû. Êvareke nîvhênik bû. Di navnan re bayekî nerm ji hêla dahl û bexçan dihat û hênikayî di bîra xelkê dianî. Ezmanê fireh çik sayî bû, gihabû ko hemû stêrikên xwe, wek çaxê ko hunermendek berhemên xwe di saloneke mezin de bi cîh dike, di xweşiya bêdengiyeke ker de bi pûteyî raxistibûn. Cîhê baştirîn dabû Hirçê, her heft li ber çavan bûn. Û kakêşan jî, ji
117
SORÊ GULÊ

seriyekî heta seriyê din raxistibû, diçirisand, di nav şemalê de bû. Aşiya êvarê li ser bajarê Nisêbînê, hêdî hêdî girantir dibû. Dengê straneke xemgîn ji operlorên sînema bajêr dihat, li gor bayê sist, dadiket û bilind dibû û li ser bajêr belav dibû. Dengê ferûcên salê ji malên hêla rojava dihat. Kela wan jî wek a xort û xwendevanan germ bû. Hîna fêr nebûbûn bê dîk kengî bandidin û kengî nadin. Ji nav av û darên ber têlan jî, qur qura beqan dihat. Wan jî her rojê ji êvarê ve dest pê dikirin û her ko şev

kûrtir dibû, deng li hevdu bilindtir dikirin. Gava lebat ji hêla Qamîşlokê ve diket hewê, dengê wan jî diket ber bê û bilindtir dibû. Bayê ji wir, dengê dîlanekê jî bi xwe re dianî. Ji lerz û dilgeşiya ko di dengê dengbêj de bû, dihat famkirin ko yeke mezin geriya bû. Dengê civata mala Xunavê ji hewşê dihat. Xuya bû ko mêvanên wan hebûn. Hisê Mistê Tinatî jî, dîsa wek her êvara xwedê teypa xwe derxistibû ser xênî û dengê wê bilind kiribû. Reşîto, şerê Emê Gozê digot. Wê bîstikê bi xwe, ribab lal kir, naland û qulipand ser Edûla Mistefa Begê, ser wê evîndariya ko li ser bîra Hêlê dest pê dikir. Mala Hisê Misto li pişt mala Gulçînê bû, deng xweştirîn dihat wan. Lê taxê tevî, çi êvara ko hebû, çend saetekî li teypa wî guhdarî dikir. Carekê duduyan jê re hatibû gotin ko dengê wê daxe, lê gotin bi serê wî de nediçûn, wî her wek xwe dikir. Li hêla din, li mala Têliyê, bêdengî serdest bû.

Dema Misto hat, hîna di ser xwarinê de bûn. Gulçînê di çêkirina xwarinê de dereng ketibû. Hûr û rovî çêkiribûn. Tu zexelî nekiribûn. Di wext de li êgir kiribû, lê agir kiribû nekiribû ew hûr û ew rovî nekeliyabûn. Dereng tê derxistibû ko pîr bûn, wek cilik û lastîkê bûn. Valakiribûn mersefeke mezin û li hewşê danîbû ber zarokan. Biçûk û mezinan bi hev re girtibûn ser. Piştî mirina Ûsivo û xwarina wî, cara yekem bû ko hûr û rovî li mala wê çêdibûn û cara duyem bû ko ew bi xwe derketibû sûkê û dikanan. Heta wî çaxî, Serdar û Sînemê kirîn dikirin.

Serdar nuxuriyê wê bû. Bi dû serê wî re Sînemê dihat, çardeh kiribûn. Di rastiyê de, berî wê, yeke din bi navê Sînemê hebû, hîna çaxê deh mehî bû miribû, lê ew yek ji nifûsê re negotibûn. Bi dû re, ev Sînema ko niha sax e çêbûbû. Îcar neçûbûn ew qeyd nekiribûn. Navê a ko miribû, dabûn wê û kiribûn bedêla a din. Sînemê di nifûsê de ewa din bû. Ji ber wê yekê, li gor nifûsê sal û nîvekê ji rastiya temenê xwe mezintir bû, pazdeh û nîv kiribûn. Dibistan ji sala pêncan terk kiribû û li malê hêdî hêdî mezin

dibû. Hîna di wî temenî de, dilê wê bi şermokî di Misto hebû. Sînemê baş spehî bû, lê ji ber ko kêfa Misto ji navê wê re nedihat, pir guh nedi-

dayê. Him ew û him jî hîna bi wî awayê ko wê jê hez dikir, ne amade bû ko ji hinan hez bike. Û nedixwest ko bi xuşka Serdar re têkeve nav pêwendiyên li gor dilê xwe. Wê bi xwe dixwest ko wê bîne. Wê bi xwe hîna rastiya di wê derheqê de hemû nizanîbû, lê dîsa jî evîna Misto kizînî bi dilê wê dixist. Heger rewş li gor adetên serhediyan bê ravekirin, dismala xwe avêtibû stûyê beranê wî, lê wî dismala wê nedirevand.
Gulçînê jî pê zanîbû, dixwest ko Sînemê ji Misto re be, kêfa wê jî jê re dihat, lê malbata wî nediket serê wê. Ji hemûyan hez dikir, lê ji ber qûmara bavê wî, di derheqa wan de bi tirs û şik bû. Bavê wî, Osê Reş, ji qumarê pê ve tu karên din nedikirin, karê wî qumar bû. Gulçînê gelek caran ji Sînemê re »keça min, Misto xortekî baş e, ez jê hez dikim, lê malbata wî!.. welehî ez ji wan jî hez dikim, ma ez ê çima derewan bikim. Lê dîsa jî wan ji bîra bike keça min. Dilopeke xwîna helal di rehên bedena wan de nema ye, hemû ji perên qumarê ye. Ji xwe Hemê apê wî. Li gor ko dibêjin, hema xwedê mirov jê bisitirîne û hew« digot.
Lê yek gotin ji wan gotinan nediket serê wê. Her ko mezintir dibû, bêhedaniya hezkirinê jî di ber mezinbûna wê re, di dilê wê de mezintir dibû. Êdî çaxê wê bû.
Bi dû serê wê re Cindî dihat, yazdeh sal kiribûn, wê sala pêncan bixwenda. Bi dû wî re, du keçikên din hebûn: Xezalê û Zozanê. Xezalê heşt û Zozanê jî penc sal kiribûn.
Gava Misto li derî xist û ket hewşê, Sînemê berî hemû kesan xwe da ser hev. Serdar û Gulçînê, jê re cîh vekirin û »fermo Misto, were bixwe, xweş bûye« gotin.

Misto spasî wan kir û »bawer bin ez têr im. Muxtar tawe çêkiribû, pir xweş çêkiribû, min zikê xwe da ber û kir kelek, afiyet be ji we re« got. Çend carekî din jî jê re gotin, lê ji dil »na spas« got.
Gava kifş bû ko naxwe, Sînemê çû kursiyek jê re anî û metroyekê duduyan ji xeleka rûniştina malbatê bi wir de, li hemberî xwe jê re danî. Misto zû dest bi henekan kir û geşî berda ser malbatê. Gotin bir ser dêya xwe.
Gulçînê hinekî keniya û »ma tu diwêrî jê re bibêjî muxtar? Ya tu li vir dibêjî?«.
»Erê çawa... berê dixeyidî û ji min re »muxtar ji bo zilaman tê gotin, hey xenzîr kurê xenzîran« digot. Lê niha nerm bûye. Heger mêvan tune bin, di ber xwe de çend xeberên ne ji dil ji min re dide. Min ew fêr kiriye.«
»Ma Osê nabê çi?«
119
SORÊ GULÊ

»Newêre di ber re bajo. Gava ez wilo dibêjim kêfa wî tê, di ber xwe de dikene. Ji xwe ew pir nayê malê, bi lîstika kaxetan daketiye. Hevdu pir nabînin«.
Ên mezin hinekî di ber xwe de keniyan, lê kenê wan pir dom nekir.
»Welehî wê rojekê xaniyê we jî li ser bike, lê bê kîjan rojê ye« Gulçînê got.
»Na xanî li ser muxtar e. Hevalên wî hemû dizanin ko xanî ne li ser wî ye, tu kes li ser xênî pê re nalîze. Ez û apê xwe Hemo çûn yeka yek bi hevalên wî re axivîn. Me ji wan re got ko divê li ser xênî pê re nelîzin. Me xaniyê tu kesan navê û em ê xwe jî bi kuştinê jî nadin tu kesan. Û me got ko xanî li ser muxtar e, ne ê wî ye, hemû dizanin«.
»Ev baş e« Gulçînê got û dengê xwe li zarokan hilda: »de xwarina xwe

bixwin zarokno, wê sar bibe.«
Zarokan, bi hatina Misto re, dest pê kiribûn û xwarin hinekî bi sistî dixwarin. Misto him diaxivî û him jî dêna xwe dida xwarina wan. Zozanê bala wî kişand, lê rewş hîna baş ji hevdu dernedixist. Tavilê tê derxist ko xwarin baş nekeliyaye. Zozanê dev perçakî dikir û xwe bi herdu destan pê ve dadiliqand û dikişkişand, lê tiştek jê nedibû. Geh destên wê ji perçê hûr difilitîn û geh jî hûr ji devê wê. Carekê perçê hûr di devê wê de ma, herdu destên wê jê filitîn û kir ko bi paş de bikeve, lê Gulçînê destê xwe da ber pişta wê û ew girt. Pirqînî bi Misto ket û keniya.
Gulçînê rewşa Zozanê bi xwe nekir sedema tu kenî, kela xwarinê hat bîra wê. Tê derxist ko Misto di wê yekê derxistiye. Bêyî ko li bendî gotina wî raweste, bi kenekî nerm got »tu dê dîsa dev biavêjî xwarina min, ez zanim!«.
»Çavê te li te be Serdar« Misto got. »Bawer be heger destên te jê bifilitin û li ser çavên te bikeve, wê wek ko kulmeke Alî Clay lê keve, reş û şîn bibe. Li hêla me, carekê bûyereke wilo bûbû. Malbatekê serî û hûr çêkiribûn. Lê wek xwarina we ne keliya bûn. Li gor ko tê gotin, wek lastîkê bû. Li ser wilo, pevçûn di nav jinikê û mêrik de derketibû. Mêrik pir li ber xwarinê ketibû û rabûbû li jinikê xistibû. Jinikê jî ji ber êşa nava xwe û xema taba ko pê re dîtibû, îdare nekiribû û li mêrik xistibû. Bextê reş ko ber çavekî wî reş û şîn bûbû. Sibehê dema derketibû nav zilaman, sedema reşbûna ber çavên wî jê pirsîbûn. Wî jî negotibû min û jinikê li hevdu xistiye. Lê »keça kerê hûr ji me re çêkiribû, ne keliyabû, dema min gez kir û kişand, seriyek di devê min de ma, seriyê din jî ji nav destên min filitî û li çavên min ket« gotibû. (Malbatê dest bi ken kir) Lê

ma kî bawer dike. Dema hinên din dihatin û li reşbûna ber çavên wî

dipirsîn, ên ko berê li çîrokê guhdarî kiribûn, ji bedêla wî ve, »şevê din hûr çêkiribûn, lê ne keliyabû, hûr ji nav destên wî filitî û li ser çavên wî ket« digotin û bi pirqînî dikeniyan.« Lê tu kesan bawer nedikir.«
Gava Misto wilo got, malbat ji ken lal bû. Gulçînê bi serê pêşmalka xwe hêsir ji çavên xwe zuwa dikirin. Biçûkan mesele baş fam nekiribûn, lê dîsa jî wek mezinan bê rawest dikeniyan. Hingî Serdar keniya, kuxikeke hişk ew girt. Heta hêsir ji çavên wî hatin kuxiya. Gava kuxikê ew berdi-da, dîsa dikeniya. »Li xwe miqate be keko, tu bibêjî nebêjî, wê xelk bibêjin weleh dêya wî lêxistiye« Misto got û ken dîsa di devê wî de teqand. Zarok jî bi wê yekê bêtir keniyan.
»Lawo welehî ji esir ve dikele, lê wek cilik bû, pîr bû, nekeliya. Wî qesabê diranpîj û zikmezin ez xapandim. Heta bibe sibeh, ez ê herim wî bihetikînim. Pereyên me lê ne helalbin. Nizanim bê wê rebena pîra Koçerê çawa bixwe. Ez ê sibe herim xwe biavêjimê, bila li min negire« got û êdî dismalkek ji ber pişta xwe derxist û du libên hêsiran ji çavên xwe zuwa kirin. Lê tu kesan tê dernexist ko ne hêsirên ji ber ken tenê ne. Dû re, »lawo Misto xwedê te bihêle, tu eybekê li mirov venaşêrî« got kenekî ne ji dil, ji bo veşartina giriyê xwe kir, giriyê xwe, di nava xwe de fetisand. »Ev çîroka ko tu dibêjî li newala me jî hatibû serê yekî«.
Misto keniya û »ev ne eybek e, xaltî. Ma heger ko nekele, çi gunehê te heye. Tiştê ko em dikin, kenekî bi dostanî ye« got û xwest ko dilê wê xweş bike. Dû re li Serdar fitilî û »em ê dereng bimînin ha, zû, em herin. Te zikê xwe têr kir. Bi navê xwedê tu îşev natewî. Tu dê ramanên ji ên hemû kesan baştir pêşniyar bikî. Ma kê vê êvarê hûr û rovî xwarine ko bikarib-in bi afirandina ramanan nigên xwe li ên te bixin?«.
»Yadê bi xwedê wê îşev te li derve jî bihetikîne. Bigihije kê, wê qala hûr û rovî bike. Te çû xwe dîsa kir devê wî« got û çû dest û devê xwe bişo.
»Na gidî, xaltîka Gulçînê çi stêle ye. Gava em xwe bi xwe bin, xem

nake. Lê bawer be li derve gotin ji devê min dernakeve«.
»Na kurê min Misto, na. Tiştên wilo tên serê hemû kesan. Ne dikeliya, ma min rebena xwedê dikarîbû çi bikira. Heta ez sibe herim ser wî qesabê zikmezin«. Zarok dîsa bi gotina »zikmezin« keniyan.
»Wilo ye xaltîkê, welehî wilo ye. Serdar jî henekan dike« got û li Serdar hilat: »em herin, em ê dereng bimînin, zû!«
»Temam, xelas« got û careke din devê xwe bi avê dagirt û tê werda.
»Ma hûn ê bi ko de herin, çi karê we heye ko hûn wilo lezê dikin?«
121
SORÊ GULÊ

Gulçînê got.
»Em ê herin bajêr, karekî me yê biçûk heye, tu serê xwe pê ne êşîn xaltî«.
Dema Gulçînê, »lawo, ez bi gorî serê we bim haya we ji we hebe« got, Serdar û Misto xwe kar kiribûn û berê xwe dabûn deriyê hewşê. Herduyan »baş e, baş e« gotin û di kuça nivtarî re berê xwe dan rojhilat û
piştî meşa sîh metroyekî, êdî berê xwe dan bakur. Piştî ko derketin ser kuça mezin, dîsa berê xwe dan rojhilat û çûn. Piştî dused metroyan, gava gihan çarêyê, îcar ketin kûça ber bi bakur ve û qederekî çûn. Ew kuçe, di ser xeta hesin re derdiket nav dahl û bexçên bakurê Nisêbînê. Serdar hî-na jî li ber diranên xwe dixebitî. Dor dused, sêsed metroyên din çûn. Lokaleke teng û dirêj li wir hebû, tije mirov bû û bi hêrs û bi dengê bilind, bêyî ko li bendî hevdu rawestin û li hevdu guhdarî bikin, diaxivîn. Wir ji dixana çixaran kiribûn wek hêtûnekê. Kursî, li ber dîwaran bi rêzê hatibûn danîn. Çend kursiyên biçûk li navê jî hebûn. Hin jê xwende-vanên ciwan bûn û hin jê jî ya karkerên pembo bûn û ya jî çawîş bûn. Li

dawiya lokalê, yekî dor sîhsalî û simbêlmezin li ser kursiyeke bedew, li ber maseyekê rûniştî bû. Pir bi xwe bawer xuyabû. Bi qapanî qalûn dikişand û dixan di nav simbêlên xwe re berdida. Dema berê perwanê diket aliyê wî, dixana qalûna wî di herdu aliyên wî re, bi lez diçû bi pişt wî de û wen-da dibû. Qutikê wî yê sipî, zendikqut bû. Zendên wî yên tazî, qalind bûn û bi pirçeke reş nixumandî bûn. Destên wî nerm û şahîk bûn, ne wek tu karkeran bû. Lê ne wek xwendevanan jî bû.
Li ber dîwarê bakur, li tenişta Mahmê qelenderî, kursiyeke tenê vala mabû. Serdar û Misto herdu çûn li wir rûniştin û rê lê teng kirin. Li aliyê wî yê din, Hadiyê Sofîhincyas û Izzetê mala Hesen Çawîş rûniştî bûn. Mahmê qelenderî xwe hinekî da bi aliyê wan de û rê ji Serdar û Misto re fireh kir. Piştî ko silav û silavdan xelas bû, dîsa dest bi axavtinê kirin. Dor deh deqîqên din jî bê program û bê rojev axivîn. Saet bûbû heşt. Heta wî wextî dor bîst-sîhekî din jî hatin. Hin hatibûn li orta lokalê çar-mêrkî rûniştibûn û hin jî li devê derî li ser nigan rawestiyabûn. Seyfê Gavanan di nav ên li devê derî de bû. Izoyê Xezebo hat li tenişta wî rawestiya. Tavilê yek ji ên ko li tenişta xwediyê qalûnê bû, devê xwe bir ber guhê wî, dû re jî wî guhê xwe da ber devê wî, bi dorê tiştin ji hevdu re
gotin û rabû ser xwe. Bi zimanekî xweş, tika bêdengiyê kir û xêrhatin da hemû kesên li wir. Ji kincên wî, ji lebata wî, ji gotinên ko digotin, xuya dibû ko li bajarekî mezin xwendevanê dibistaneke bilind bû û pir zane

bû. Nisêbînî bû, lê çend salekî nehatibû Nisêbînê. Tu axavtina zêde nekir û »wê niha serokê sendîqê ji we re biaxive, fermo Smaîl« got û rûnişt. »Gelî karkeran... û gelî xwendevanan. Hûn hemû bi xêr hatine sendîqa xwe. Hin dibêjin ko sendîqe, a min e. Na gelî hevalan... ev sendîqe, a we

ye. Em çûn, me ji Enqera anî.« Wê bîstikê, Xalitê Kevanan û çar hevalên xwe hatin. Kêfxweşî ket civatê. Li pêş, li nêzîkî masa serokê sendîqê, cîh ji wî û hevalekî wî re vala kirin û ew birin wir. Hersêyên din jî li ortê bi cîh kirin. Gava berê Xalit ket aliyê Serdar, bi serê xwe silav li hevdu kirin. Lê Mahmê qelenderî bi dengê bilind »Xalit tu û hevalên xwe bi xêr hatin« got û çixare dan wan. Piştî ko serokê sendîqê jî xêrhatin da wan, îcar gotina xwe domand: »gelî palan, me dît ko xwedîerd we erzan dixebitînin, me çû sendîke anî. Îcar heger hûn bi a sendîqa xwe bikin, wê sendîqa we û hevalên xwendevan roja we bilind bikin«. Li wir hinekî rawestiya û »na bavo, ne em ê rojana we bilind bikin.. em ê bikin ko xwediyên erdan bêgav bibin û rojana we bilind bikin« got û bi serbilindiya serketina gotinên xwe yên heta wir, qalûna xwe ji nû ve pêxist. Piştî ko çend hilm lê xistin, çavên xwe li ser guhdaran gerandin û »lê divê em hemû yek bin. Erê divê hûn hemû xwe bikin yek hevalno. Heke na, sendîqa we nikare alîkariya we bike. Gava em çûn û me sendîqe ji Enqera anî, Behîce Boran jî wilo got. Em berî sê rojan mêvanê wê bûn«.

Yekî ji rêza ber dîwarê aliyê wî yê rastê, destê xwe hejand û »em hemû yek in, ev îro deh roj xortan em fêr kirine... bê ûjdanên axan me belaş dixebitînin, ma em ê çawa ne yek bin« got.

Yekî din jê bi wir de »em ji yekîtiyê dernakevin.«

Yekî din »ên ko tifaqê xera bikin, bêşeref bin.«

»Na tu kesên ko ne di tifaqê de ne, li vir tune ne.«

»Îro roja me ye, ma em ê heta kengî ji wan re belaş bixebitin?«

»Zarokên min nexweş in, lê ez nikarin wan bibim ser doktoran. Ne pere hene û ne jî ez karim nerim kar. Ma ev edalet e?«

»Lawo bi telaqên jinberdanê heger ko em ne pîs bûna, wilo li me nedikirin. Ma ko em nerin kar, karin xwe çend rojan li bendî me bigirin? Em pênc rojan nerin, wê bên li ber gunê lawên me bigerin. Lê em pîs in.

Em hevdu nagirin.«
»Gelî camêran ka rawestin. Min hîna gotina xwe hemû negotiye. Divê em yek bin min gotibû. Hûn jî wek min dibêjin. Ez dîsa dipirsim, ma ge-lo em ên li vir hemû yek in?«
»Erê.«
123
SORÊ GULÊ

»Erê, ma kî ne di tifaqê de heye!«
»Em hemû yekin.«
»Ka em sondê bixwin.«
»Heyran em ê hemû ji hevdu re sondê bixwin.«
»Bi xwedê... »
»Bi qesem... »
»Bi telaq... em yek in.«
»Gelî camêran ka rawestin...«
»Ê ko tifaqê xera bike...«
»Ka hinekî bi xwe bikaribin û li camêran guhdar bikin. Em hemû bi dilê xwe li vir in û di tifaqê de ne. Hûn çima gotinên ne xweş dikin«
Remoyê çawîş bi hêrs got. Ew û Xidir li tenişta hevdu bûn, du çawîşên xurt bûn, karkerên wan her salê pir bûn. Hemû kesan zanîbû ko bê dilê xwe hatine civînê. Xwendevan heftakê-deh rojan bi taybetî ketibûn nav wan û ew sor kiribûn. Êdî nema bi karkerên xwe karîbûn.
»Gelî camêran guhdar bikin. Heger em hemû yek bin, divê em bizanibin bê em ê çawa bikin« serokê sendîqê got û ji bo ko bikaribe civînê kontrol bike, rabû ser xwe. Bi destê rastê işareta ko rawestin dikir.
»Em narin kar.«
»Erê em ê kar rawestînin.«

»Ka rawestin, guhdar bikin« dîsa got.
»Bi namûs piştî ko me tifaqa xwe girêda, em ê li nava sûkê bazbidin ser zikê ên ko xaîn bikevin« Mahmê qelenderî got.
»Wey tu çavê min î Mahmo« Hadî got û keniya. Izzet jî li tenişta wî keniya û baweriya wî lê xurttir kir.
»Gotina wî ye, divê wilo be« yekî din ji rêza hemberî wî got.
Seyfo ji devê derî got »ez û tu em ê wî karî bikin Mahmo«.
Biroyê çawîş got »heger em wilo nekin, nabe, xebera Mahmo ye«.
Xwendevan hemû di ber xwe de dibeşişîn, xwe serketî û xurt didîtin. Êdî karker radibûn. Şûran simbêlên Xalit nedibirîn. Çixare ji a din vêdix-ist. Sebir ne bi wî û ne jî bi tu kesên din re mabû. Dibûn şahidên destpê-ka bûyereke dîrokî. Ji xwe şoreşan wilo dest pê dikir. Karker ji hemû aliyan radibûn, bêdestûr diaxivîn û fort dikirin. Xwendevanan awirên xwe ji ser yekî dibirin ser ê din û bi baldarî guhdarî dikirin. Gotinên Mahmê qelenderî kêfxweşiyeke din dabû wan. Seyfê Gavanan wek gurekî piştşîn bû û li pişta wî bû. Êdî wext hatibû. Serketina çînî nêzîk bûbû. Kel di nava wan de germ bûbû. Lê hîna dora axavtinê nehatibû

wan bi xwe. Dema dor hat bê divê çi bikin, wî çaxî wê rê û raman pêşni-yar bikirana.
»Gelî camêran ka rawestin« serokê sendîqê got. »Gelekî baş e ko hûn hemû yek in. Îcar divê em eşkere bikin, bê divê em çawa bikin. Niha wê hevalê me Elî di vê derheqê de ji me re biaxivê. Fermo Elî«.
Ên ko mereq dikirin, êdî bihîstin ko xwendevanê dibistana bilind, bi navê Elî bû. Elî çixara xwe vemirand, carekê duduyan kuxiya û bi dengekî ko bawerî dida, dest bi axavtinê kir: »gelî hevalan, em hemû bawer in ko rojana we palan erzan e. Hûn bi xwe jî wilo dibêjin. Ji xwe

rojana zarok û pîrekan nîvê heq e. Hemû palên pembo bi nanûzikê dixebitin. Û em hemû di wê baweriyê de ne ko divê ne wilo be. Dema em hemû bixwazin ko divê ev yek bê guhertin, bêguman wê bê guhertin. Piştî ko me di vê yekê de li hevdu kiriye, êdî tiştê ko divê em bikin dimînin. Divê em di vê derheqê de jî xwe bikin yek û tu kes xwe nedin paş. Em ên ko îşev li vir in, em ne hindik in. Em piraniya hêza karkeran û çawîşan in. Lê gelek ên ko gotina wan kar dike nehatine. Em negihan hemû kesan û me nikarîbû hemû kesan bi vê civînê bihisînin. Lê em dîsa biryarê digirin ko em ê sibe na, lê dusibe kar rawestînin. Heta em bi şêwir rojana karkeran bilind nekin, em nahêlin ko tu kes herin tevrikê. Dibe ko hin derkevin û bixwazin herin, lê divê em wan rawestînin. Lê sibe ji bo ko em bikaribin wext bibînin û ji hemû kesan re bibêjin, bila herin. Lê sibê na, dusibe zû, em ê di devê rêyan kevin û tu kesan bernedin. Heger em wilo bikin, axe nikarin xwe deh rojan li ber me bigirin, wê bên li ber me bigerin. Ma em di vê de jî li hevdu dikin?«.
»Bavo wek te ye. Em hemû bi gotina te re.«
»Ebeden, tiştên ko te gotin, hemû rast in.«
»Em nahêlin ko yek here.«
»Bi xwedê em nahêlin ko mêşek ji bajêr derkeve.«
»Nikarin xwe li ber me bigirin, em xurt in.«
»Wan em perîşan kirine. Do welatê me firotin û îro jî me tazî dikin. Bes û temam ji destên van axan. Heçê ji ser vê yekê dakeve, ne tiştek be.«
»Heçê dakeve, ne ji bavê xwe be.«
»Erê weleh, heçê dakeve ne ji bavê xwe be.«
»Bavo hewcedariya ko hûn rabin di huzûra camêran de gotinên nexweş bikin tune ye. Hima bi xwedayê nûranî yek ji me nare kar« Xidir rabû ser xwe û got. Xidir çawîşê pêncî û heft palan bû û li ba Hecî Xerabê Kurîsan û Sebriyê Ûsivê Medê tevrik dikir. (Hecî Xerab, navê Hecî Xerîb e, lê ji

ber ko ne Heciyekî rehet e, navê wî bûye Hecî Xerab.) Her salê çawîşê wan e û havînê pê de kar ji bo wî heye. Ji ber wê yekê gelekan xwe lê digirtin û pê re diçûn.
»Gelî hevalan, ka guhdar bikin. Hevalo, ji kerema... hevalno ji kerema xwe re guhdar bikin. Divê em xwe par vebikin û bizanibin bê wê kî li ko be û ko vala dimîne. Heke em wilo nekin, nabe. Gelî hevalan du rê ji bajêr derdikevin. Û ev kuça han jî, derdikeve ser îpekê. Divê serê her rêyekê ji vana, pazdeh-bîst zilam bigirin. Divê em ji bo çi rêya ko heye, bi kêmasî çawîşekî û xwendevanekî wezîfedar bikin. Em xwendevan di nav xwe de axivîne. Hersê kesên ko wê derkevin, kifş in. Ew xwedî gotin û pişt in. Ew ê deh-pazdeh xwendevanên din jî bi xwe re derxin. Û hûn ên din jî, kî ji we bikaribe bê, werin ser rêyan. Belkî hewcedarî derkeve û heval alîkariyê
ji we hemûyan bixwazin. Sibe na dusibe, bi wan re derkevin û rêyan bigirin. Wê Hadî û Izzet û çend hevalên din jî bigerin û rewşê kontrol bikin.« Seyfo destê xwe hilda û »ez jî« got. »Erê, rast e, Seyfo jî bi wan re ye. Heger tiştin biqewimin, ji wan re bibêjin û bi wan bişêwirin. Ew çi darî deynin ber we û bibêjin, ez hêvîdarim ko hûn ê bi a wan bikin. Me ew ji nav xwe hilbijartine û tiştê ko bibêjin, li ser navê me hemûyan dibêjin. Ez hêvî dikim, ji kê ji we re çi bibêjin, hûn ê bi a wan bikin. Wê gelek xwendevan bên alîkariya we. Ma em di vê de li hevdu dikin?«
»Erê, em li hevdu dikin.«
»Erê.«
»Ez ê derkevim ser rêya aliyê îstasyonê« Miradê çawîş got. Mirad çawîşê sîh û du karkeran bû. Ew bi piranî diçû tevrika Mala Diranzêran û Mala

Hûran, lê dema vala bûya, diçû a hemû kesan.
»Ez jî bi te re têm« Mûsa got. Mûsa çawîşê sîh û şeş kesan bû. Her salê tevrika mala Nigmezinan û gundiyên wan dikir.
»Ez û Cangîlo jî em dirin ser rêya Mêrdînê« Seydo got. Seydo bi esil Dêrikî bû. Ji ber wê yekê piraniya palên wî Dêrikî bûn. Hejmara wan di nav sîh û pêncan û çilî de dihat guhertin. Seydo û Cangîlo cîranê hevdu bûn. Cangîlo bi eslê xwe qereçî bû. Lê êdî qereçiyan bi karê klambêjiyê û gerandina dîlanan tenê, nema karîbûn debariya zarokên xwe bikin. Êdî dengbêjî, nema karê wan tenê bû. Ji ber wê yekê, wî jî ji demekê pê ve, hersalê qereçî hemû bi xwe re kar dikirin û diçû tevrikê. Tev hinek cîranên xwe yên Omerî, carê traktorek tije dikir.
»Yabo weleh ez jî bi we re têm« Şêxê Mencê got. Şêxo, Omerî bû û dor sîh û pênc kes pê re radibûn.

»Ez û Xelo jî dirin ser xeta hesin digirin« Biro got. Dema Biro wilo got, Xelo devê xwe bi şermokî ji hevdu vekiribû û rêza diranên wî yên zêr di nav lêvên wî re diçirisandin. Biro û Xelo herdu jî Omerî bûn û her yekî ji wan çil-çil û pênc palên wan hebûn.
»Ez jî diçim wir« yekî din rabû.
»Ez jî bi we re têm« yekî din jî derket.
Elî dîsa di nav dengan re »baş e gelî hevalan. Xwendevanên ko wezîfe girtine, wê bên û xwe bi we bidin naskirn.« Bi dû re dengê xwe hinekî bilindtir kir û »sibe na dusibe, yanî roja pêncşemê, em dernakevin ser er-dan. Em ji niha ve bigihên kê, em dibêjin heta ko di derheqa rojana palan de lihevhatin çênebe, tevrik tê rawestandin« got û rûnişt.
Serokê sendîqê devê xwe bir ber guhê wî û çend gotin jê re gotin. Wî çaxî, »çû, tevrik hat rawestandin« çarpênckan bi hevdu re gotin. Piştî ko

Elî rûnişt, çend saniyan ji hemû aliyan deng derdiketin. Bi pirani gef bûn, nav di hevdu didan.
Smaîlo, Elî û hevalê wî, tiştin ji hevdu re digotin. Gazî kirin Xalit û ew jî birin ba xwe. Piştî bîstikekê, serokê sendîqê rabû ser xwe û »gelî camêran, niha baş guhdar bikin. Ji bo ko li ser navê me hemûyan bi xwediyên pembûyan re herin bazaran bikin, divê em hinan ji nav xwe hilbijêrin. Em ê wan hilbijêrin û ji wan pê ve tu kesên din narin bi xwediyên pemboyan re bazaran nakin. Heger hin bi serê xwe herin, ew tifaqê xera dikin û em ê gotina wan li erdê bixin, em ê pûç derxin. Îcar heger hûn bi a min bikin, ez, Remo, Mahmê Qelenderî, Biro, Elî, Xalit û Seydo em bibin berdevkên we. Ma hûn ji vê re çi dibêjin?«
»Baş e« çend deng bi hevdu re derketin.
»Baş e« çend dengên din jî ji ber derî derketin.
»Bavo hûn çawa bikin, hûn û xwedê kefîlên me. Em hemû xwe disipêrin we. Divê hinek ûjdan bi mirovan re hebe. Li ser bextê min be roja palan erzan e, hew heqê çend weqiyeke bacan e. Ev yek wilo nabe. Hûn herin bi wan re bazaran bikin û vê yekê ji wan re bibêjin« yekî salmezin got.
»Waye apê Îsa ji bedêla me hemûyan ve got« gelek deng bi hevdu re derketin.
Hadiyê Sofîhincyas bi xiroşî destê xwe hilda û berî ko hin destûra ax-avtinê bidinê, »ka hemû li min guhdar bikin, niha dora min e... ma ne we dît bê apê Îsa çi got? `roja palan erzan e, heqê çend weqiyeke bacan e` got.
Em vê gotinê bikin slogana xwe. Em dikarin wê weqiyê, bikin kîlo û

bibêjin. Wan çendan jî, jê biavêjin. Binerin çiqasî xweş dibe: roja palan erzan e, heqê kîloke bacan e«.
Jê re li çepikan xistin û »me qebûl e« gelek dengan gotin. Ken û kêfxweşî li ser dev û lêvên xwendevanan bû. Lê bal hinekî belav bûbû. Mahmê Qelenderî, »heyran, bila pale, sibehan dema diçin û êvaran jî dema tên, heta di nav bajêr tevî re derbas bibin, roja palan erzan e, heqê kîloke bacan e, bibêjin« got û destê xwe li pişta hadî xist. »Weleh tu de-qek î«.
Deng ji hemû deran derket û »me qebûl e, ev ma wilo« gotin û di ber xwe de dubare dikirin. Hadî dîsa li nîşanê xistibû û bûbû gula civînê. Çixarak derxist û pêxist. Xalit serê xwe jê re hejand û pê re beşişî. Serdar bi destan diyar kir ko dixwaze biaxive. Elî destê xwe ber bi wî ve kir û »fermo Serdar. Gelî hevalan, rawestin, ka li Serdar guhdar bikin« got.
»Spas Elî. Gelî hevalan, dema mirov biryardariya li vir dibîne, mirov dibe xwediyê baweriyeke xurt. Ez bawer im ko em ê zora wan bibin. Hadî jî tiştekî xweş got. Divê ew slogan, wek Mahmo got, bê gazîkirin, lê ez dixwazim tiştekî bibêjim, ez bawer im em tiştekî ji bîra dikin. Karker ne hew ji bajêr tenê diçin. Gelek ji gundan diçin û gelekan jî li dora gundan kon vegirtine û li wir dimînin. Divê em derkevin nav pemboyan jî, divê em wan jî betal bikin. Nabe ko hin herin û em ên din bigirin.« (Gelekan di ber xwe de »xebera wî ye« gotin.) Û tiştekî din, gelî hevalan, em sibe li ser hemû çawîşan bigerin û ji wan tika bikin ko heta ne bi şêwir be, ner-in tevrikê. Em ê şêwra xwe dîsa li vir bikin. Em li hevdu bikin ko destûra çûnê, komîta bazarê dide.«
»Ev jî rast e, divê em şêwrê xera nekin.«
»Em hemû wek hev in.«
»Wilo ye, heta em hemû nerin, divê tu kes nere.«

»Tiştekî din gelî hevalan« got, »em derdikevin ser rêyan û xelkê digirin. Dibe ko hin cira xwe nexweş bikin. Heta ko em bêgav nebin, em li tu kesan naxin, lê em destûra ko hin li hevalên me bixin jî, nadin tu kesan. Gotinên min ev bûn, sipas«.
»Ev xort kî ye, xwedê wî bihêle çi şareze û bîrbir e« yekî li ber dîwarê hemberî wî, ji ê li tenişta xwe re got.
»Weleh ez wî ji dê û bav nas nakim, lê ez gelek caran dibînim. Xortekî delal e« ê din lê vegerand.
Ên li dora Smaîlo li hevdu nerîn û bi awiran peyitandin ko rast e. Dû

re Elî, »spas Serdar. Ez bi xwe bawer im ko xebera te ye. Divê em wek ko te got bikin«.
Misto enîşka xwe li bin çengê wî xist û »xuya ye ko tu û Elî hevdu nas dikin« jê re got.
»Erê, em hevdu nas dikin.«
Misto wek ko bibêje »gelo hevdu çawa nas dikin« serê xwe hinekî hejand û gotin birî.
»Ma wê kî here nav pemboyan?« Elî pirsî.
»Ez û Serdar û Misto û em ê çend hevalên din jî derxin û herin hêla rojhilat« Mahmê qelenderî got. »Baş e Serdar, Misto« Mahmo berê xwe da wan û pirsî.
Serdar, »baş e« got. Misto jî bi serê xwe kifş kir ko wê biçe.
Ji bo hêla rojava û hêla bakur jî çar grûpên din hatin avakirin.
»Divê em sibe derkevin li ser çawîşan bigerin. Ez, serokê sendîqê, Xalit, Serdar û kî din bi me re tên« Elî pirsî.
»Ez jî têm.«
»Ez jî têm.«

»Misto jî tê« Serdar got.
Ji ber derî jî dudu derketin û xwestin ko bi wan re biçin. Ji ber dîwarê aliyê rastê jî duduyan hevdu qane kirin û gotin ko wê bên.
»Baş e, em têra xwe derketin. Em xwe bikin du beş« Elî got. Yekî din ê wek wî pê re bû, lê ew qet ne diaxivî. Carê gava Elî diaxivî, di navinan re li wî jî dinerî û diaxivî. Wî jî carê serê xwe dihejand û diyar dikir ko piştgiriya gotina wî dike. Xuya bû wilo li hevdu kiribûn ko wê yek ji wan biaxive.
Li gor ko li hevdu kirin, wê Elî, hevalê wî, Mahmê qelenderî, Serdar û Misto û du kesên din, sibe êvarê derketina ser çawîşên taxa rojavayê çem û ên din jî bi serokê sendîqê re li ser ên li rojhilatê çem bigeriyana. Wê Xalit û Seydo û çend hevalên din jî li taxa dora xeta hesin bigeriyana. Wilo li hevdu kirin û şêwir wilo girêdan.
Civîn yazdeh û nîvê şevê belav bû. Dema hêdî hêdî radibûn ser xwe û berê xwe didan malên xwe, Serdar çû ba Elî, li ser nigan çend gotin ji hevdu re gotin û vegeriya ba Misto. Mahmê qelenderî, »Serdar, Misto! em hevdu sibe bibînin û şewira xwe girêdin, ne?«
»Erê, îşev bûye dereng« Serdar got.
»Erê lo, îşev bes e, em sibe hevdu bibînin, em niha herin mala xwe, dereng e« Misto got.
129
SORÊ GULÊ

Êdî karker diçûn malên xwe. Serdar û Misto berê xwe dan hêla jêr. Pêşî Misto xwest baştir bizanibe bê Serdar û Elî hevdu ji ko nas dikin û dû re gotin guhertin, birin ser roja karawestandinê. Geh Serdar digot wî guhdar dikir û geh jî wî digot û Serdar guhdarî dikir. Bi wî awayî hêdî hêdî di ber hevdu re dimeşiyan. Dinya ker bû. Xelk, ji bo karê roja ko dê bi-

hata, ketibûn xewa giran. Lê gava nêzîkayî li kuça mezin a ko diçû Mêrdînê kirin, dengê teqînê ji hudût hat û ji hevdu zêde bû. Piştî bîstikekê, bû wek ko xwê bikeve êgir. Xuya dibû ko li wan nêzîkan bû. Heta di ber mala beytar re derbas bûn aliyê din ê kuçê, du cemse û panzêrek wek bê ji hêla bajêr ve hatin û derbas bûn û çûn bi hêla teqînê de.

Êdî Serdar û Misto gihabûn serê kuça Belengazan û dengê teqînê pirtir û nêzîktir bûbû. Xuya bû hewara ko ji leşkeran re çû jî dest bi teqandinê kiribû. Berê kuça Belengazan, li dirêjayî li wir bû. Ev xeterek bi serê xwe bû. Gule, wek sersotan di ser taxê re diçûn bi vî alî û wî alî de. Hin jê pir nizm bûn. Fîzîniya wan li ber guhê mirov dixist.

Serdar û Misto xwe didan ber dîwaran û dimeşiyan. Gava gihan ber deriyê mala Koçerê, dengê pîrê dihat: »bi xwedê wê dîsa dehan ji me bikujin« digot û bi dengekî wek dengê nalînê gazin dikirin. Heta wir, gavên xwe radidan û bêdeng dimeşiyan. Piştî bihîstina wê gotina pîra Koçerê, Misto, »bi navê xwedê wê dîsa sê-çarkan bikujin. Waye panzêrê pêşiya wan girt, nema karin xwe xelas bikin« got.

»Xuya ye ko halê wan ne baş e, wek ko dora wan hatiye girtin, xuya dibe. Lê heger bigihijin û têkevin nav malan, belkî xelas bibin. Heke na, kî bi panzêran dikare û kî ji ber wan xelas dibe« Serdar got.

»Rast e, tu dê bibînî, heger sibe çar-pênc laş derneketin, ez tiştekî nizanim. Ji dengê tivingan kifş e, di zikê hevdu de berdidin«.

»Erê bi xwedê«.

Xwe gihandibûn ber mala Serdar. »Misto were, tu jî li ba me rakeve, îşev nere malê, tu dibînî bê çi tofan rabûye!«.

»Na lo, tiştek li hêla mala me tune ye, ez ê herim malê.«

»Weleh tu bi a min bikî, tu naçî, dibe ko hevdu bi wî alî de bajon û tu di nav wan de bîmînî.«

»Na lo, du gav in, ez ê xwe di Kuça Teng re rast berdim Kuça Dengbêjan û ji wir jî xwe berdim a me û herim. Wê dêya min pir meraqan bike, guneh e. Ez ê herim, şev baş«.
»Çavê te li te be, hima ko te dît rewş xeter e, vegere... wê guhê min li de-

riyê me be, ya jî xwe di ser dîwêr re biavêje hewşê.«
»Baş e, şev baş, êdî tu jî here, tu dê binerî ko ji wî seriyê kuçê derketin... kuça we jî xeter e«.
Misto da rê û Serdar xwe bi lez gihand ber derî. Lê êdî wek ko tiving di guhên wî de diteqiyan. Li bendî ko hin bên derî jê re vekin nema, di ser dîwêr re qulipt hewşê. Gulçînê ji ser xênî pirsî bê ma kî ye. Serdar bersiv da. Gulçînê bi keder got, »lawo, vê tofanê hûn li van kuçan li çi yê xwe digerin? Wê rojekê tivingin li bin çengê we bikevin û kezeba me li ser we bişewite, lê ka bê kîjan roj e. Hûn rojekê li malê rûnanin. Ma ka Misto, ma hûn ne bi hevdu re bûn, te ew li ko berda?«
»Belê weleh, heta serê kuçê em bi hevdu re bûn... ew ji vir çû malê.«
»Te çima ew berda lawo, ma ne dînitiye ko di vê tofanê de çû malê. Dikarin hevdu bi wir de bajon û ew jî di nav wan de bimîne. Ax! Tu dê rojekê felekan bînî serê xwe, tu jî dê min bihêlî û herî. Tu jî li mala xwe rûnanê. Ma ez ê bi dû re xwe bi kê bisenidînim Serdar? Tu nabêjî min, hi...«
»Tiştek nabe yade, xwe bêzar neke, ez ji xeterê dûr im«.
Gulçînê û zarok hemû li ser xênî di nav nivînande bûn. Raketîbûn. Bi dengê tivingan şiyar bûbûn. Ne di tu xeterê de bûn. Serdora xênî heta dor navikê bilind bû. Heger mirov raketî bûya, tu xetera gulan nikarîbû hebûya. Lê xaniyê hemû kesan ne wilo bûn. Gelek li ser xaniyê xwe, di xewê de dihatin kuştin. Ji kîsî xwe diçûn. Carê sibehê, »teqîn derket û gu-

lak çû lê ket« dihat gotin û piştî rapora doktor dihatin veşartin. Li tu sucdaran nedihat gerandin. Bûyereke normal bû, wilo dihat dîtin.
Piştî ko Serdar ketibû hewşê û Gulçînê pirsa Misto jê kiribû, dilê wî bêtir ma bi dû de. Poşmaniyeke tarî girt dora dilê wî. Ji xwe re »gerek min ew bi zorê bigirta û nehişta ko here. Heger tiştek bê serê wî... ez ê xwe qet
efû... weleh jîr e...« got. Hinekî li hewşê rawestiya û di ber van ramanên qut qutî re, li dengê tivingan guhdarî kir. Serê xwe hilda û li jor nerî. Gule wek sersotên êgir di ser wî re difiriyan. Dixwest bizanibe bê ji hêla mala Misto ve jî deng û gule tên an na. Şer, hîna jî li dor hêla dibistanê û goristanê bû. Çend gavan bi derencê ve hilkişiya û rawestiya; hinekî li dengê tivingan guhdarî kir, texmîna ko dikir, tu deng ji dor hêla mala Misto nedihatin, lê tu tiştekî bi esehî ji hev dernedixist. Gulçînê di wê navê re »xwe biqulizîn û hilkiş û xwe zû bavêj pişt serdorê« got. Lê wî çaxî, çend gule bi dû hev re di ser serê wî re firiyan. Fîzînî bi hewê xistin. Ji devereke nêzîk teqiyabûn. Xwedê dizanê di nav tûya mala Têliyê re firiyabûn.
131
SORÊ GULÊ

Pirtpirt bi çûkên li ser ketibû, çendik ji wan bê kontrol difiriyan ser şaxin din, ya jî ji ber tirsa mirina kamax di şaxên xwe werdibûn. Zûrîna kûçikê wan wek a guran bû. Elokên malika nêfî ko nû ji gund barkiribûn wir, dengê xwe qut nedikirin. Zarokên cîranan ji her derê dest bi wî babet giriyê ji ber tirsê kiribûn. Ji tirsan qîjînî bi Zozanka biçûk ket, xwe hepişand paşila Gulçînê û dengê xwe birî. Serdar, »batil, batil, batil, gelo segbavin rast berdidin min, ev çi ye« di ber xwe de got. Gulçînê dengê xwe lê hilda û »niha newe, li min rebenê wê li te kevin, xwe bitewîn, bêhna fireh wer. Ax! hûn heta van çaxan li derve li çi digerin« got. Serdar xwe

nizm kir û ma, li wir li gulên ko di ser wir re difiriyan dinerî û guhdarî dikir. Zanîbû ko heta wir parastî bû, xaniyên taxê û dîwarên hewşê di ber de bûn. Dema dît ko gule hinekî di ser wî re firk bûne, hema bi leza pisîkê bi derencan ve hilkişiya, xwe avêt pişt serdorê û li ser çar lepan çû ser nivî-
nan. Ji nû ve, wek leşkerê ko ji gulebarana dijmin xelas bûbe û gihabe kozikeke asê, kesereke kûr veda.
»Bila ev şev ji te re bibe guhar û di guhên te keve. Weleh wê rojekê fîşekin li te kevin, weleh wê rojekê mala min xera bibe, bê ka kîjan roj e« Gulçînê bi keder û gazin got.
Serdar hinekî bêhnteng bû. »Ma em xwe ji ber wan û bêxwediyên fîşekên wan di hunduran de bikin hepsî, dayê. Her rojê karê wan wilo ye. Ji bo ko em xwe ji wan biparêzin, divê em ji mala xwe dernekevin«.
»Na kurê min, heta derengê şevê li sûkê nemîn, hinekî zûtir werin, teqîn bi piranî dereng dibin. Berxê min dema teqîn derdikevin û tu ne li malê yî, wek ko ez li ser êgir im. Heger tu li ber canê xwe nakevî, li ber min bikeve. Ez ê bêyî te li dinyê çawa bikim. Ez ê bibim gur û bi çiyan bikevim« got.
Êdî kifş dibû ko lerza girî ketiye dengê wê, tirsê girtiye bedena wê. Serdar li ber ket û li kirina xwe poşman bû.
Xwest ko hinekî alikariyê pê bike û »ka xwe bêzar neke yadê, tiştek nabe, lê baş e, bi soza xwedê ez ê carê bikim ko ez bikaribim zûtir bêm« got û baş dêna xwe da dengê tivingan û gulan. Misto ji bîra wî nediçû. Lê êdî dengê tivingan ji ba bîrikan de dihat, hevdu bi aliyê bakur de ajotibûn. »Êdî dûrî mala wan ketine« di dilê xwe de digot. Hinekî ewle bûbû. Gava xewê avêt ser çavên wî, dengê tivingan jî firk bûbû û bi dûr ketibûn.
Roja din hat bihîstin ko li ser xaniyekî nêzîkî goristanê, zarokeke deh

mehî di dergûşê de û du mêr jî li nav goristanê hatine kuştin. Dihat gotin

ko ew qaçaxçî bûn! Lê lawik li kêleka dê û bavê xwe, di dergûşa xwe de bû, gulak çûbû û lê ketibû. Heta şev nebûbû roj û xwîna wî nedîtibûn, pê nizanîbûn ko tiving lê ketine û miriye. Ew jî wî çaxî wek hemû zorokan giriyabû, lê dû re deng jê biliyabû. Di zikê dê û bavê wî de ko bêdengiya razanê bû. Lê gava dêya wî bi rohniyê re xwîna wî dîtibû, ji nû ve qîrînî pê ketibû û li xwe xistibû. Ê cotekî ciwan ê pêşî bû.
Rojeke nexweş bû. Nisêbînê dîsa şîndar bûbû. Sûk û kuçe dîsa wek her carê tije leşker û polîs bûbûn. Lê heçê xortbûn, karê xwe, wek ko plan kiribûn, bi jîrî dimeşandin. Piştî nîro, rewş sisttir bû. Ber êvarê bi qeflan çûn serdana malbatên kuştiyan. Ew yek ji bo serketina xwe hewce didîtin.
***
Nisêbînê bi civîn û şêwiran dikeliya, di nav germê, şer û teqînan de dişewitî û Qamîşlokê jî bi germeke hîn xerabtir dişewitî û bi dîlanan di-hejiya.
Gava ew hefta bi şêwir û lihevdugirêdanê û bazdanê mişt çûbû û a din bi ser mala Şemê de hatibû, hîna jî tu deng ji Ebû Merwan derneketibû. Êdî wextê soza ko Ebû Ferîd dabû malbatê hatibû û çûbû. Cîh lê teng dibû.
Dibêjin ko kul û êş û derd û bêzarî xwe wek mêşên hingiv li hevdu di-girin. Gava tiştekî tahl tê serê mirov, sedên din didin dû. Wek ko yek li bendî a din be, dikin. Gava rê vedibe, îcar eşkere didin dû hevdu. Anîna jinekê, di wextê kirîn û firotinê yê baş de hatibû û ketibû stûyê Ebû Ferîd. Xelkê di deriyekî wilo teng de deynên xwe nedidan. Karê derxistina paswanê nedimeşiya. Bi ser hemûyan de, yekî dirêj, girs û bêaqil hat li

dikanê bela xwe tê da. Hima hew lênexist. Nikarîbû dest jî li ber hildana. Destên wî di bin mêrik re, wek baskên pengueneke nivqefilî jê daliqiyan û lerizîn.
Duşem hat. Ebû Merwan ber êvarê telefon da û ji bo ko bi derengî ketibû, lêborîn xwest. Ê wan ê mezin ko îmza dawî li ser dixist, ne li mal bû, lê bixêr wê sibehê bihata.
Sêşemê heta nîro jî tu deng ji Ebû Merwan derneketin. Nîroya dereng telefon da û got ko ê wan ê mezin hat, lê mêvanên wî zû hatin, negiha ko tu karan bike. Bi xêr piştî nîro wê bihata û îmze bikira.
Rojeke germ û giran bû. Bêhna hewayê teng bû. Carnan, di navinan re, ba, wek ko bi taybetî dixwest xwe di bin tozê hilde û vegere, ji jor de di-hat, xwe di bin tozê hildida, toz û kaxetên kuçê bi hewayê dixistin û diçû.
133
SORÊ GULÊ

Kaxet zû dadiketin lê toz hinekî dima. Hîna berî ko dakeve û hewa ji tozê pak bibe, bayekî wilo xaîn dîsa dihat, hinek din bi hewayê dixist û diçû.
Li ba dikana Ebû Ferîd, ba ket bin kirasê yeke Ereb û bilind kir, tu nemabû ko li serê wê bigerine û wê bihetikîne. Piştî bîstikekê, ew bextreşî hat serê yeke Kurd jî.
Gava siya êvarê dadiket ser kuçe û kolanên bajêr, ba sekinî, hewa pak bû, sûk û kuçe dîsa bi mirovan hatin dagirtin. Bi dû hezar karan de bûn. Hinan jê jî, xweşiya gera nav bajêr dikirin.
Êdî ro li ber ava bû. Ezmanê hêla rojava, niv sor bû, wek ko jengeke tenik girtibû ser. Xiroş di dilê Ebû Ferîd de rabûbû. Lê wî çaxî Ebû Merwan telefon da. Paswan amade bû. Xwe daqul kir bin masa ber xwe û rahişt kîsê xelatan. Di nav xelatan de, tiştên ko baş di naylonê re xuya dikirin, du gurûzên cixarên Kent bûn. Berî ko derkeve, pere li bêrîkan

par vekirin. Kaxetên hindik kirin bêrîkên ber destan, ên din veşartin, qumçe li wan girtin û berê xwe da ba Ebû Merwan.
Li hêwanê, Ebû Nezîr derket pêşiya wî û ew bir. Ebû Merwan li hinek kaxetan dinerî. Ebû Ferîd, xelata Ebû Nezîr li ber derî dayê û bi paş de şand. Ew û Ebû Merwan bi tenê man. Li halê hevdû pirsîn, lê dixwest zû biçe malê. Pir neaxivîn, karê xwe zû kirin. Li ser derketinê, Ebû Ferîd sê kaxetên sedan dan destê Ebû Merwan. Gava destê xwe dirêjî peran kir, qutikê wî li ser milê wî qijilî, berê stêrkên li ser milê wî baştir ketin rohniyê û çirisandin. Her milekî wî sê stêrikên wek zêrê zer li ser bûn. Ma çiqasî bi qutikê wî yê reng gewre diketin. Dilê Ebû Ferîd bijiya wan û di dilê xwe de »çi mezinayî ye... heger min jî xwendibûya, niha ez ê jî wilo bûma« got. Lê pir ji xwe bawer nekir û »na welehî, me nakin tiştek... nahêlin ko em wilo mezin bibin« ji xwe re got, xatir jê xwest û derket. Serbilindiya xwe bir ji malbatê re. Dê û bavê wî, »saeta te xweş, xwedê te
li serê me û zarokan kêm neke« gotin. Sarê bi dilgeşî dibeşişî û li bavê zarokên xwe dinerî.
Hiso got, »kurê min weleh tu baş taibî. Lê ma em çawa bikin kurê min, çavê me hemûyan li te ye, karên wilo, karên te ne«.
»Na yabo, taba wê çi ye. Lê a sext ew e ko bêbavan vê demê paswanan nadin hemû kesan. Heger zilamên mirov ên xurt di hukûmetê de tune bin, qiloçên mirov jî bên, mirov nikare tu paswanan ji nav lepên wan derxe. Bi xwedê dor hezar lîrên min li vî alî û wî alî çûn. Hemû tişt bi qeweta peran û zilamên xurt dibin«.
»Wilo ye kurê min, ma ez nizanim. Lê bila karê mirov bimeşe, pere

xem nakin. Tên û diçin. Dema ez wek te xort bûm, ma çi pere ketin aha

wan destên bavê te... Hemû wek ko hatin, çûn jî. Min digot wê tu caran xelas nebin. Ma ne wilo bû Xanê? (»belê welehî wilo bû«, bi serbilindî lê vegerand) Xwedê, wek ko dide, rêya xerckirinê bi ber mirov dixe. Xanê jî dizanê, elhemdulah, min hemû di rêya baş de xerc kirin. Kurê min, heta îro jî xwedê rê li ber te vekirine û pere li perên te zêde kirine, şikiriya xwe bîn. Bila xwedê rahm û bereketa xwe ji ser mirov kêm neke, belên xerab û nexweşiyên giran neyne serê mirov, wekî din xêr e. Him peran dide û him jî rêya xerckirinê dide ber mirov«.
»Xebera bavê te ye, xem nake kurê min... malê dinyê hemû ê xwedê ye, dide jî û distîne jî. Bila serê zarokên te sax be. Ez ê ji te re duan bikim. Wê xwedê îşê te rast bike«.
»Weleh pere qet nayên ber çavê min. Ma pere çi ne«.
»Wilo ye. Xem nake« Sarê got. »Bila tu li serê me sax bî, ma pere çi ne.«
Hîna gava gotin li ser wilo bû, Seîd hat. Hiso jê re got ko paswana wî amade ye û divê xwe ji bo sibe kar bike. Piştî ko şîret û tembî lê kirin, gelek silav ji bo Hecî Elî gotin, dora peyvê da maliyan. Hemûyan bi wî awayî dora xwe kirin. Dora dawî a Sarê bû. Wê piştî silavan, rê û rêbaz jî jê re rave kirin. Diviyabû Seîd taksiyekê bigire. Kî ba xem nadikir. Hemû kesan taxa mala bavê wê nas dikir.
Roja din, dema roj şêrîn bû, Seîd berê xwe da Nisêbînê. Bi meşê çixarak bû. Lê dîsa jî di derheqa serxetê û Nisêbînê de mereqdar bû. »Gelo çawa ye« ji xwe re digot. Cara pêşî bû ko diçû serxetê. Dibihîst, lê bi çavan nedîtibû ko herdu bajar bi gelek awayên xwe, hîna jî wek hev in. Îcar didît. Gerek bajarek bûna. Lê wê rojê çûn û hatina xelkê bi xiroş bû, tirsek li ser bajêr hebû. Êvara duşemê teqandin li ser têlan derketibû, du kuştî hebûn. Ji ber wê yekê, sûk û kuçe hîna tije leşker û polîs bûn. »Lê bila serê xwe bixwin, sûk û kuçên bê polîs û bê leşker tunene. Divê ev yek jî, wek çîroka daristanê û berêz be. Divê xweşî û spehibûna daristanê bi

çend berazan kereh nebe. Heta ko em desthilatê bistînin, em ê vê yekê biguherin.« Dilê xwe wilo xweş kir. Ji bo wî, ne rewşeke nedîtî bû.
Di bajêr bi xwe ramiya, lê nerî. Eşkere didît ko ferqeke mezin tune ye, kêm zêde wek hev in. Lê dîsa jî hin ferq dîtin. Lewhên navên dikanan bi tîpên cuda bûn û zimanê leşker û polîsan, ne erebî bû, êdî tirkî bû. Dema bi hevdu re diaxivîn, dibû »şeldim bildimê« wan. Lê pir guhê xwe neda wan, di rewşa wî de, tiştên wilo bala mirov pir nakişînin. Tiştekî din di bîra wî de bû. Û êdî nêzîkayî lê dikir. Kêf û xiroşî tev hevdu bûbûn.
135
SORÊ GULÊ

Hemû tişt wek ko Sarê gotibûn û hemû bi dilê wî bûn. Gava çûbû, berî hemû kesên din, Gulê li ber derî dîtibû. Spehîbûneke nedîtî bû. Wê bîstikê dil dabûyê. Sarê di derheqa spehîbûna wê de kêm û qet ne zêde gotibû. Êşa ko bi dîtina wê re dabû dora dilê wî, bi zorê û heft belan di nava xwe de hiştibû û nedabû der. Divê mêvan, mêvan be, giran be, bi hesab û hedan be. Wilo bawer dikir û wilo kir.
Mala Hecî Elî, ew wek mêvanekî ezîz hilanîn û danîn; qet nehiştin ko xwe li xerîbiyê û li mala xerîban bibîne. Êvaran, heta derengê şevê li dora wî diciviyan û bi malbatî şevbuhêrk dikirin. Pir bi giramgirî diaxivîn û qala hemû tiştan dikirin. Lê qet neketin dû sedema hatina wî. Hew carekê tenê jê pirsîn. Wî jî »hinek karê min li bajêr hebû, min xwest ez we
jî bibînim û nas bikim... Sarê jî tembî li min kiribû ko ez bêm we bibîn-im« got. Ev pirs careke din nema jê hat kirin.
Xalit û Sêvê jî êvara pêşî hatin şevbuherkê. Wî û Xalit ji hevdu hez kirin. Lê Xalit zû rabûbû çûbû û derengê şevê, piştî teqandinê bi nîvsaetekê, bi taksiyekê hatibû dû Sêvê û ew biribû.

***
Seîd ji Xalit hez kiribû, lê Xalit lê vala nedibû. Xalit di nav civîn û şêwiran de bû. Civîn û şêwiran, Nisêbînê ji hêla jîna kar ve jî germ kiribûn.
Heta roja pêncşemê, karê rawestandina tevrikê hatibû serastkirin. Tu tiştekî kêm nemabû. Çawîş hemû ji rewşê hatibûn agahdarkirin û topa karkeran pê hatibûn hisandin. Her tişt tekûz kiribûn. Bûbûn agir. Carê gava sibehan diçûn û gava êvaran jî vedigeriyan, di seranserê sûka bajêr re
»roja palan erzan e, heqê kîloke bacan e« digotin û sûk dihejandin û der-bas dibûn. Saw didan bajêr. Bi dehan traktor û kamyon derbas dibûn û bi hevdu re wilo digotin. Gelekan ji wan re li çepikan dixistin.
Roja pêncşemê, dema roja wan hatibû, her tişt wek ko plan kiribûn, bûn. Yek çawîş tenê jî neçû ser pemboyan. Ehmê Cemîlo xwest ko kark-erên xwe derxe, lê kirin serê wî ko wê nikaribe here û tifaqê xerab bike. Hin karkerên bê çawîş jî hatin, xwestin ko herin ser karê xwe, lê rê hemû girtî bûn.
Tifaqa wan sê rojan xwe wilo girt. Lê roja çaran ji vî alî û wî alî deng derketin, dest bi gazinan kirin. Gelek ji çawîşan dernediketin ser rêyan. Hîna roja duyem hat gotin ko Remo û Xidir gelek çinvinê dikin û dibêjin ko »karberdan gunehekî mezin e. Em dibin sedema hişkkirina pemboyê

xelkê, xwedê vê yekê dibîne, weleh em neheqiyê li camêrên xwedî erd dikin.«
Ev yek diket serê gelekan. Ji xwe Remo qet derneketibû ser rêyan û ji tifaqê re tu kar nekiribû. Xidir jî hew roja pêşî, dor bêriyan derketibû ser xeta hesin, xwe pêş xelkê kiribû û vegeriyabû mala xwe. Roja sêyem hat gotin ko Remo dibê »heger ez sibe jî nerim, bi kuştinê jî be, ez ê dusibe

herim karê xwe.«
Remo çawîşekî mezin bû, karkerên wî her demê ji şêst kesan pirtir bûn û ên bijarte bûn. Remo berî hemû kesan dest bi kar dikir û piştî hemû kesan xelas dikir. Kesên ciwan û ên ko dixwestin gelek karî bikin hemû diçûn ba wî. Tevrika Hecî Ehmedê Gundikî û Zahirê Hesen Çawîş dikir.
Ber êvarê hat gotin ko Remo, Xidir û Ehmê Cemîlo çûne ba Mala Sebriyê Ûsivê Medê. Hat gotin ko Hecî Ehmedê Gundikî jî hatiye wir û dikin bazarê girêbidin.
***
Roja duyem bû ko Seîd li Nisêbînê mêvan bû. Rojeke wek hemû rojên din germ bû û ezman jî çik sayî bû. Hewa bêlebat bû, ba ji hêla çiyan nedihat. Wext bûbû piştî bêriyan. Roj gihabû ko hênikayiya di hewayê de tevî germ bike. Êdî êgir dest pê kiribû û dibariya. Hecî Elî çûbû karê xwe, Ûsiv çûbû karê ko bavê wî li ba xwe jê re peyde kiribû û Kamûran jî derketibû sûkê. Seîd, Gulê û Stiyê li hêwanê rûniştibûn. Hêwaneke dirêj û du derî bû. Deriyek li bakur û yek jî li qublê bû. Ba bê neyê, daîm wext lebata bayê hênik di deriyekî hêwanên wilo re tê û di ê din re derdikeve. Deriyê sê odan û ê aşxanê jî ji hêwanê vedibûn. Gulê nû çayê dagirtibû û rûniştibû. Wê berdestî dikir. Axavtin di nav wê û Seîd de bû. Qala tiştên ko li dibistanan dixwînin dikirin. Qala pirtûkan dikirin. Di derheqa navên pirtûkan de bi sextî ji hevdu fam dikirin, lê bi heter dixwestin hevdu li ber bixin. Stiyê jî carnan xwe diavêt nav û dixwest ko mijarê biguhere û xwe bike şirîka axavtinê, lê nedibû. Bala wan li ser xwendinê û pirtûkan bû. Wê bi xwe jî, di derheqa xwendinê û pirtûkan de nikarîbû tu tiştan bizanibe û bibêje. Aramî ji bedena wê çûbû. Geh radibû ser xwe û bi firavînê ve dibeziya û geh jî dihat li ba wan rûdinişt. Dîsa hewl dida ko gotinê bîbe ser tiştên ko ew jî jê fam dike, lê dîsa nedibû.

Dema di derheqa pirtûkên M. Gorkî de diaxivîn û bi baldarî li hevdu guhdarî dikirin, dengê teqîna destek çek hat. Ne pir dûr bû. Her sêyan li hevdu nerîn û bê deng rawestiyan. Gulê rabû û derket derve. Zer bûbû.

137

SORÊ GULÊ

Wek ko zanîbû bê çi bûye. Seîd da dû wê. Nêzîkbûna li wê jî xweşiyek di-dayê. Stiyê jî derket. Destekî din jî teqiya. Gulê gihabû hewşê. Piştî dengê duyem, bi biryardarî berê xwe da ser xênî û bi derencan ve hilkişiya. Stiyê lê hilat û xwest ko dernekeve ser xênî, lê Gulê bi a wê nekir. Seîd jî da dû wê. Tiştê ko Gulê dît ko li nav erdên rojavayê mala wan, dor pêncsed metroyan dûrî wan, xortin ji ber polîsan direviyan. Çawa direviyan... nigên xwe li pişta stûyê xwe dixistin û direviyan nav malan. Ji kincên wan xuya dikir ko tu kesên nas di nav wan de tune bûn. Li aliyê rojhilat nerî, hinek xort ji wir jî bi aliyê malan ve direviyan. Rêya bajêr di ba wan re bû. Dixwestin xwe bigihînin nav bajêr û xwe di nav malan de wenda bikin. Tu polîs bi dû wan de ne xuya bûn. Lê hemû ewlehiya ko Gulê tê de bû, hilweşiyabû. Seîd û Stiyê jî didîtin, lê tu mane nedidanê. Nigên wê erd nedigirtin. Di ber xwe de, bi qasî ko deng here Seîd jî »xwendevan û polîs in« got û bi lez daket jêr. Seîd negiha ko jê bipirse bê çi dawe ye, çima wê germê xwendevan û polîs li nav wan erdan wilo ketine dû hevdu. Tu tiştek fam nedikir. Gulê rast di deriyê hewşê re derket û berê xwe da hêla xortan. Li ser rêya wan sekinî. Piştî ne bi gelekî, xortên ko ji aliyê rojhilat ve ber bi bajêr de direviyan, gihan nav malan. Memo ji nav wan nas dikir, ew rawestand û ji wî pirsî. Li ser ecelê bû, lê dîsa jî nîvrawestiya û bersiva çend pirsan dayê. Gulê ew bernedida.

»Ma Serdar û Misto jî ne di nav we de ne, xebera te ji wan tune ye.«

»Ew dûr çûne, li hêla rojhilat in, lê ez nizanim bê li wir çi bûye«.

Memo di xiroşa lezê de bû, dixwest ko zû here û nekeve destan. Hevalên wî hemû tê derbas bûbûn û ew tenê li dawî mabû. Heger biha-ta girtin, wê polîsan bi lêdanê navê hemû kesan jê bikirina caw. Hetîketiya mezin ew bû. Gulê rewş fam dikir, rû lê dananî, ew berda. Lê mereqdarî wek kevirekî giran daketibû ser dilê wê û mabû. Gava ên pêşî gihan rasta mala Tahlo, pîrekên wan derketin ser xênî û ji kêfa serketinên xortan re sê deng lîlandin. Ew her demê heval û piştgirên xortan bûn. Dema polîs gihan ba mala wan, îcar daketin pêşiya wan, di kuçê de, bi ke-viran li ber wan pahn bûn û nehiştin ko di kuça wan re serjêrî dû xortan bibin. Lê ew bi xwe jî baş êşiyan. Serê bûka wan bi du cîhan şkest û qîza wan a mezin jî ji tengala xwe êşiya. Lê serketin, bû a wan. Keç û bûkên mala Tahlo, bi wê kirinê deng li bajarê Nisêbînê dan.
Dema Gulê vegeriya, xemgîn xuyabû. Seîd li ber deriyê hewşê bû, Stiyê ew li wir girtibû, nehiştibû ko dûrtir here. Parastina lawê xelkê ji xeteran, vatiniya wê bû. Ew mêvan bû, xort û kelgerm bû, xerîb bû, nizanîbû. »Te

çi bihîst Gulê« Seîd got.
»Xwendevan û polîs in, keko. Min berê bihîstibû ko wê wilo bibe. Xwendevan dixwazin rojana karkeran bilind bikin, ji ber vê yekê, îro der-ketine û ji karkerên bê çawîş ên ko hîna li ser erdan in, daxwaz dikin ko kar berdin. »Xwendevan, xwediyên erdan wan erzan dixebitînin« dibêjin. Polîs jî hatine û bi dû xwendevanan ketine.«
Dema wilo got herdu guhên Seîd miç bûn. Dengê gotina »keko« qet nebihîst. Bûyer tiştekî ji bo wî gelekî balkêş bû. Xiroşeke bêhedan girt bedena wî. Pirs li ser pirsê jê kirin. Gulê bi qasî ko karîbû, bersiv didan pirsên wî, lê hişê wê li ser Serdar bû. Ji xwe bi xwe re »ma dibe ko tiştekî wilo bibe û ew ne di navde be. Heger tiştin bên serê wî, ez ê çawa bikim«

digot. Êdî xemgîn bûbû. Kêfa wê bi carekê re çûbû. Lê tîna mereqdariya Seîd bi xwe, nedişikest. Dixwest ko Gulê gelek tiştan di derheqa bûyerê de jê re bibêje û baştir fam bike. Hin ji xewn û hêviyên wî jî misoger bûn ko di wê rêyê re derbas bibin pêşerojê. Ew rê, li gor wî jî rêyeke avakirina jîn û dinyake geştir bû, nîşana xwestina babetekî azadiyê û hezkirina jînê bû. Di wê derheqê de gelek pirtûk xwendibûn û fêrî gelek tiştan bûbû. Di derheqa karawestandina karkerên febrîqa Putîlo û rola kêştîvanên Petrogradê de xwendibû. Lê hîna tiştekî wilo bi çavan nedîtibû. Tiştên wilo li ba wan nedibûn. Ji ber wê yekê, Seîd bawer nedikir ko dê bikaribe tiştekî wilo di pêşerojeke nêzîk de bi çavên xwe bibîne. Bîra ko wê li Nisêbînê bibîne qet nebiribû.
»Ma îro dest bi karawestandinê kirine«.
»Ez baş nizanim, lê dibe ko îro be«.
»Nizanim bê xwendevan çi ji dinyê dixwazin. Bi hemû tiştan diaxivin. We çi ji erzanbûna rojana xelkê ye lawo, ma bi serê we ketiye ko hûn wi-lo dikin û bi dû re van belan tînin serê xwe« Stiyê bi keder got.
»Weleh çavê min in jinxalê, bila wilo bikin, xebera wan e, divê hin li halê xizanan jî bipirsin« Seîd got û xwe hinekî nêzîkî Gulê kir û bi dengekî nîv nizm »ma gelo Xalit jî di nav wan de ye« got. Gulê bi hejan-dina serê xwe, jê re eşkere kir ko ew jî di nav wan de ye.
Stiyê gotina xwe domand: »lawo ma ne çend cot erdê me jî hene, wê sêhrê li me jî buha bikin ha«.
»Xelk xwediyên bi hezaran cotên erdan in, jinxalê, heger li wan buha bû, bila li we jî piçekî buha bibe. Xem nake. Xelk birçî û tazî ne. Min bi-hîstibû ko xelk bi jin û zarokên xwe ve diçin, lê incex têra nanê çend ro-jan derdixin. Ma ev edalet e, xwedê ji te razî? Vê germê, li ber vê rojê, ro-

jane nehêja ye çi qasî. Ma ne wilo ye Gulê, ma çiqasî didin wan?«
»Belê weleh wilo ye. Hima bibêj bi nanûzikê ye, hew heqê çend kîlo bacan û îsot in.«
»Tu dibînî jinxalê? Ev ne tu edalet e. Xebera wan e jinxalê. Heger ko bikaribin bikin, wê bi hezaran reben rehettir bibin. Bila çend qurûşên we jî kêmtir bibin, xem nake«.
»Lawo welehî ez nizanim bê kîjan baş e û heq e, lê berê tiştên wilo qet tune bûn. Xwediyên erdan û çawîşên palan li ser rojana palan li hevdu dikirin û sêhr dima ew. Tu kesan dengê xwe dernedixist. Lê dibêjin ko hin çûne Enqera û ev fitneyî ji wir anine. Li taxa din Sindoq vekirine û yekî Hêştirekî jî kirine mezinê xwe. Dibêjin ko simbêlên wî di bin karika guhên wî re derdikevin. Ma qey ew jî xwendevan e? Bi xwedê dibêjin ne xwendevan e û ne jî pale ye« got û xwest axavtinê ji ser wê mijarê bibe.
»Çaya me jî sar bû, nema tê vexwarin. Ka rabe dîsa germ bike kaça min«.
»Erê weleh, min ji bîra kiribû, ez ê niha germ bikim«.
»Welehî wê baş be, çaya we xweş bû, adeta we serxetiyan û çayê ji a me baştir e û çaya we jî ji a me xweştir çêdibe«.
»Ez ê niha germ bikim« Gulê got û bi germkirina çayê ve beziya. Çûn û hatina wê bi xiroş bû. Tirsek di bedena wê de hebû. Wê zanîbû tirsa wê çi tirs bû.
Seîd, ji ser pişta Stiyê daneket, avaxtin domand: »lê baş e jinxalê, ma ne mala wî Hêştirekiyê simbêlmezin ava? Him ne karker e û him jî ne xwendevan e. Lê dîsa jî rabûye û alîkariya rebenan dike. Ma çi jê baştir heye? Divê hin alîkariya xizanan bikin. Heke na, wê bîr nebin û rê dernexin«.
»Xuya ye xwendevanên hemû deveran wek hevdu ne. Seîd jî wek ên li ba me ye« Stiyê hinekî bi qerf got û rabû ser xwe. »Niha xwarina min binî, girtiye«.

Seîd hinekî bi dilovanî keniya û bi dû de nerî. Ji kirina xwe ne pir mem-nûn bû. Lê hêvî dikir ko wê ew munaqaşa kin ko di nav wan de bûbû, ji bo wî nebe sedema pûanên xerab.
Gava Gulê ji aşxanê vegeriya, Seîd, »dêya te sindoq gotibû. Ma sindoq çi ye Gulê« got û xwest ko axavtinê bi wê re bidomîne.
Gulê hinekî keniya û »dêya min şaş dibêje. Ne sindoq e, sendike ye. Ne partî ye, lê tiştekî wilo ye, a karkeran e« got.
»Min fam kir! Ên wilo li ba me tune ne, lê min di pirtûkan de xwendiye. Îcar ez dizanim bê tiştekî çawa ye. Ew jî vekirine ha, welehî baş e«.

Çaxê Seîd û Gulê hîna nû dest bi axavtinê kiribûn, Hecî Elî nîv bêhn-teng ket derî. Gulê û Seîd ji ber rabûn. Stiyê nû ji aşxanê hatibû hêwanê. Piştî qewet danê, li sedema bêhntengiya wî pirsî. Li ser teqînê bû. Bêyî ko wext derbas bibe, »tu li van xwendevanan« got û pifîn pê ket. »Nizanim bê çi bi serê wan ketiye ko nahêlin xelk herin karê xwe bikin. Vê germê rojek tenê ji bo pembo wek mehekê ye, wê pemboyê xelkê hişk bikin û xisara dinyakê li hatina pembo bikin. Bergîlê zavê min jî daye pêşiya hemûyan. Welehî heger min ji bavî wî şerm nekira, min ê Sêvê jê bisten-da. Lê baş e, bila guhê min çaroxa wî be. Û Smaîlê Hêştirekî... him! Wî jî xwe kiriye mezinê sindoqa wan û wan sor dike. Welehî xelk kulibîne. Ji xwe ê Qelenderî... wek gayê ko di nav golikan keve. Di wî derî re nare û çûye bûye hevalê xwendevanan. Te çi ji tiştên wilo ye lawo! Çi bi serê te ketiye! Heqê wî ko mirov wî di ber ereba goşt xe. Baş e ko pemboyê min pêr av dabûn, hîna ne wexta tevrikê ye.«
»De ka bêhna xwe hinekî fireh bike apê Hecî. Madem ê te avdayî ye, tu serê xwe pir pê neêşîne. Ka bê çawa dibe, tu jî wek xelkê. Tu îro westiyayî

xuya ye. Ma karê we pir e« Seîd got û xwest mijara axavtinê biguhere. Li gor ko fam dikir, heger di ber re biajota, wê ne ji xêra wî re bûya.
»Erê bi xwedê vê demê kar pir e. Bavo li qusûra min mêze neke, ez ji germê û ji ê Qelenderî aciz bûme. Bi qasî sê xwendevanan heye, serê wî di wî xanî hilnayê, ew jî ketibû nav wan zarokan û li ser erdan digeriya. Li gor ko dibêjin, xelkê li nav erdên hêla rojhilat demançe li wî û ên pê re kişandine. Lê ez ê çi bibêjim... filitiye dibêjin.«
Gava wî wilo got, terqînî ji dilê Gulê hat. Memo gotibû ko Serdar û Misto çûne hêla rojhilat. Daket nav xemên kûrtir. Ji bo ko hin tê dernex-in, rabû çû aşxanê.
Wê bîstikê, Ûsiv ket derî. Ew jî wek ewrê terizan reş û tal bû. Berê xwe da bavê xwe û »zavê te bûye Enter, di pêşiya hemû kesan de li ser erdan digere û tevrikê radiwestîne« got. »Min got te ew ne yê ko mirov jinan bidyê, lê te bi a min nekir«.
Hecî »de ka tu jî vê navrojê bêhna min tengtir nek Ûsiv. Wey xwedê ruhê wî bistîne û em jê xelas bibin. Ma em çawa bikin! Çû! Min digot qey bizewice, wê li mala xwe rûnê û baş bibe« got û şewqa xwe ji serê xwe derxist, kir kaboka xwe û wek ko acizbûna xwe ya ji germê, ji Xalit, ji ê qelenderî û ji xwendevanan ji nava xwe bipijiqîne, pifîneke dirêj berda. Seîd xeter didît. Tê gihişt ko bêdengî jê re baştir e. Mêvan li ser mê-vantiya xwe bimîne baştir e. Bila Hecî biaxive ji xwe re got. Bêhna Hecî

li serê bêvila wî bû. Lê nedixwest di huzûra mêvanan de pevçûnê bi hinan re bike. Piştî ko bersiva Ûsiv dayê û bi hêrs xwêdan ji ser eniya xwe zuwa kir, gotin bir ser malbata Seîd û rewşa Qamîşlokê. Axavtina xwe ya ji wir û pê ve, hêdî hêdî nerm kirin û bi bêhnfirehî domandin. Lê sebir û bêh-

nfirehî nediket bedena Gulê bi xwe. Ew wek ko li ser êgir bû.
Seîd du roj û sê şevên wilo li Nisêbînê ma. Roja sêyem berî nîro vegeriya.
Veger, pê nexweş hat. Ji Nisêbînê û ên ko li Nisêbînê dîtibûn, hez kiribû. Dilê wî ma bi Nisêbînê ve, ma bi malbata Hecî Elî ve, ma bi qîza Hecî Elî ve.
Kul û kederên himbêzkirin û ramûsanên dev û lêvên Gulê di dilê wî de man û çû. Ne xwezî bi bedena ko dilekî wilo tê de be. Agirekî sor bi şev û rojan xwe lê dipêçe û dişewitîne.
Ji gumrikê pê ve, êdî bayê germ, wek ko ava germ bi tasan bi ser rûyê wî de bê dakirin, rûyê wî dişewitand. Bi zimanê xwe yê lewitî, ew dialast û diçû. Tê derdixist ko dilê wî bi ser Nisêbînê ve maye û Qamîşlokê giraniyeke biyan dide ser milên wî.
Xwe li tu deran negirt, rast çû malê. Mala Hecî tûrekî nokên şorkirî şixulê Mêrdînê, helawa Diyarbekirê û fisteqên Entabê lê kiribûn bar. Nû giha malê li bin tûyê avêt ber Sarê û dêya xwe.
Kelkela germê bû, xwêdan dabû û westiya bû, tî bû, zimanê wî gazekê ji devê wî kişiyabû. Lê dilgeşiya dilê wî di her lebata wî de xuya dibû. Kenekî sivik li ser dev û lêvên wî hebû. Piştî ko dev û rûyê xwe şuşt, dîsa hat li ba wan li ser kursiyê rûnişt. Xwe veparimand û wek ko bibêje »de ka ji min bipirsin bê ka min çi kir, ez çi dixwazim« û keserek veda. Sarê bê sebir bûbû, lê dixwest ko xesûya wê dest pê bike û bipirse. A rastî, Sarê
tê derxistibû ko Gulê ecibandiye, ew ê bi xwe bersiva xwe girtibû. Wê bi xwe zanîbû xortên ko bikaribin ji Gulê re bêjin »na«, hîna nehatine dinyê. Lê dîsa jî dixwest ko bi herdu guhên xwe, eşkere bibihîze. Tavilê Xanimê gotin vekir û pirsî: »ma te dît kurê min, çawa bû, tu çi dibêjî?«
Seîd, di derheqa tiştên wilo de ne ji dêya xwe û ne jî ji Sarê şerm dikir,

bi kêfxweşî karibû a dilê xwe bibêje. Xanimê gelek caran di wê derheqê de pê re diaxivî. Sarê jî gelek caran dibû şahid. Tu şerma wî di wê derheqê de nemabû. Lê dîsa jî giraniya ko tiştên rast didin ser milan, ne wek a tiştên bi henekî ne. Tu bêzariyê nade mirov, lê mirov diramîne. Ew babet giraniya ko ne dijî kêfxweşiyê ye, daketibû ser bedena wî. Xiroşî û bêrîkirin, ji xwe di bedena wî de digeriyan. Piştî pirsa dêya wî hinek xweşî

di bedena wî de peyda bû. Hîna ji nû ve gul li rûyê wî ketin û bi serbilindiya serketina xwe û qapaniya mêrantî, dilgeştir bû û hinekî beşişî.
»Baş e yadê. Qîzeke delal e, bi bejin û bal e û biaqil e« got.
»Mala xwedê hezar caran ava. Îcar ez bimirim jî xem nake. Tu poşman nabî kurê min. Li Sarê binere bê çi jina mala ye. Ew jî wilo ye. Dilê min safî ye. Di sûretê xwe de xuyabû ko bedewek e. Ma te baş dît kurê min.« Sarê di ber xwe de, bi serbilindî dibeşişî û serî lê mezin dibû. »Ma çi ji gotinên wilo ko xesûya mirov ji bo mirov bibêje, xweştir e? Bextiyarî ev bi xwe ye. Ez hêvîdar im ev bextiyarî bibe para Gulê jî. Seîd jî bedew e« ji xwe bi xwe re digot.
»Erê yadê, Gulê bedewek e«.
»Ma te keys lê nanînî, te ji wê bi xwe re tiştin negotin kurê min?«
»Na welehî yadê, min tiştekî wilo, rast û rê jê re negot. Min xwest jê bipirsim, em çend caran tenê jî man, lê min şerm dikir, min nikarîbû jê re bigota.«
»Tê çima şerm dikir, birê min? Gulê xwe ji zilaman venagire û di derheqa hemû tiştan de diaxive. Wek zilaman e, serbest e. Li gor ko ez dizanim, wê pir bi hêsanî li te guhdarî bikira« Sarê got
»Nizanim Sarê, qîzeke serbest e, do berî nîro li ba min bû, ez û ew dor

saetekê tenê bûn, em di derheqa hemû tiştan de diaxivîn, me hemû tişt ji
hevdu re digotin, lê min ew yek tenê jê re negot« got û rewşa wî hat bîra wî. Çend caran devê xwe tijê kiribû, xwestibû bibêje, lê dîsa jî negotibû.
»Xem nake kurê min, em ê jê re bibêjin.«
»Xem nake keko, ma kî pêşî bi xwe çûye ji qîzê re gotiye ma tu dê min bikî, gotina wê jê stendiye û hîna bi dû re dê û bavên wan çûne û ew jê re
xwestine? Mirov diçe dibîne û vedigere. Her tiştên din, karên dê û bavan in. Tu xwe dilteng neke. Ma gelo wê yekî ji te çêtir bike?« Sarê got û rabû berê xwe da aşxanê.
Piştî ko Sarê çû aşxanê, wek dema mirov dixwaze bala hinekan bikişîne ser gotineke pir girîng û bi dizzî, Seîd xwe bi ser dêya xwe de tewand û bi dengê nizm jê re got: »min ji Gulê pê ve, li vê dinyayê jin navin yadê; heger hezarên din di rêya wê de bin û dinya jî lê here, min ew divê. Ew e, a ko ez lê digeriyam û a ko min dixwest ko bibe jina min. Herin wê ji min re bixwazin. Gelekî spehî ye.«
Dema Sarê ji aşxanê vegeriya, Seîd mexseda dilê xwe ji dêya xwe re gotibû, dilê xwe rehet kiribû. Xanimê bi kêfxweşî û bi dilovanî dibeşişî. Seîd, ew gotin, ne ji bo ko wê razî bike, gotin. Lê ji ber ko Gulê, keleha

dilê wî safî kiribû, nema karîbû ew gotin di xwe de veşartina. Tiştên ko xwestibû ji dêya xwe tenê re bêje, dengê kizîniya dilê wî bû.
Sarê dixwest xwe tev li gotinê bike û axavtinê dirêj bike. Her gotineke ko di wê derheqê de dihat gotin, hinek kêfxweşiya din dida wê. »Çi bextiyarî ye« ji xwe bi xwe re digot. Carê dixwest dilê Seîd jî xweş bike û »tu

mereqan nexwe keko, ma wê yekî ji te çêtir bike?« digot.
»Nizanim Sarê. Belkî hilfa wê neyê ser min, belkî kêfa wê ji min re neyê, belkî ew şiklê ko wê di xeyala xwe de çêkiriye, ne şiklê min e. Dibe ko min nexwaze. Belkî ew û yekî...,« got û serê xwe dîsa berda ber xwe û gotin birî. Eşkere bû ko xem jî ketibûn dilê wî.
»Tu xwe bêzar neke, gaveke din wê bavê te û birayê te bên, ez ê ji wan re bibêjim...«
»Na yadê, ez dexîlê te me, tu dê vê navrojê vê gotinê heta wir venekî. Êvarê... piştî ko ez derkevim. Dema ez li vir im, hew qala wekî din bik. Bes silav û hal û hewal. Ji xwe îro în e, wê bavê min here xudbê. Hima wi-lo li ser nigan nabe. Êvare bibêje baştir e.«
Seîd, di nav zarokên Hiso û Xanimê de û di nav mezinên ko malê bûn de, ê biçûk bû, delaliyê malê bû; cirxweş, sernerm, zimanxweş û biaqil bû; maliyan hemûyan jê hez dikirin; bi taybetî dêya wî, hezkirina xwe her gavê jê re eşkere dikir. Û pir pê bawer bû. Tiştên ko digotin, bi serê wê diketin; bi a wî dikir. Heger bawer nekiriba jî, ji bo ko dilê wî nehêle, wek ko wî digot dikir û digot. Bêzariya wî, gelek êş dida wê bi xwe jî û dema dilgeş bûya, ew bi xwe jî pir dilgeş dibû. Ji ber wê yekê jî her xwestina wî bi dilxweşî dianî cî. Xwe li ber xwestina wî ya bi rebenî negirt û »baş e kurê min; êvarê. Ma malî çawa bûn?« got.
»Baş bûn, gelek silav dikirin. Waye gelek xelat û xwarin jî li min kirin bar, di wî tûrî de ne. Mala bavê Sarê çi mirovên baş in, nedihiştin ko mirov pê bihise ko mirov mêvan e. Û dixwestin ko hemû tiştên xwe bi carekê re çêbikin û ji mirov re bînin ser sifrê. Çi dilfireh in. Û Hecî, bi wî temenê xwe dixwest ji min re xizmetê bike, min çi qasî şerm dikir. Çi camêr bû. Welehî do bêhna wî hinekî teng bûbû. Xwendevanan tevrik rawestandibûn, lib neçûbû ser erdan. Hecî jî baş bêhnteng bûbû. Ji Xalitê zavê xwe pir aciz bûbû. Xuyaye Xalit îştîrakî ye û yek ji mezinên xortan e.

Lê qet nebû sedema ko Hecî camêrtiya xwe sist bike.«
»Tu ji camêriya xwe dibêjî keko. Bavê min ji mêvanan pir hez dike, di mala xwe de wilo ye û bi rastî jî merd e.«
»Weleh wilo bû. Heger min bi çavan nedîta, min bawer nedikir.«

»Mirovên berê, di mala xwe de kêmaniyê naynin ser xwe kurê min. Nahêlin ko gotin bê ser camêrtiyê. Camêrî wek zêrekî zer e, pir giran-buha ye. Xelateke ji xwedê ye, bi mêvanan re li ba hemû mirovan digere. Li ba kê be, divê bi rûmet hilîne û deyne, divê nexe nav nigan. Hecî Elî vêna dizane, kurê min. Erê erê, felekê... ma berê çi camêr li dinyê hebûn. Bi navê xwedê karîbûn gayê xwe ji ber cot vekin û ji mêvanên xwe re ser-jê bikin. Mirovên berê ne wek ên îro bûn. Ne li ber a xwe û zikê xwe tenê bûn. Lê Hecî Elî, hîna jî ji gelek camêran camêrtir e. Xwedê xêrên wî binivîse, gelek başî bi xelkê kirine û gelek nan daye mêvanan. Ji ber wê yekê jî Xwedê nehiştiye ko tu caran destteng bibe û biheyire« got û hinekî ma. Ji nifşkê ve got »Erê serxetê erê. Erê warê bav û kalan, warê xweş û şêrîn... ma wir jî wilo germ bû kurê min?«
»Erê welehî, wir jî wek vir bû. Digotin hinekî hêniktir e. Ez jî bawer im ko rast e. Lê do piştî nîro ez û Ûsiv em çûn ciyêkî bi av û bexçe. Nava wê dehla nêzîkî mala bavê te. Bise navê wir çi bû...çi bû...«
»Berac« Sarê got.
»Eh. Berac bû. Xwedêyo, ma wir çiqasî xweş bû. Heger bihişt hebe, ew der e, wir bi xwe ye. Dar, av, sî, repin, ba, hênikayî û bêhna gul û çîçekan... bihişt bû. Dibejin ko rojên şemî û yekşeman, li wir cîhê ko mirov nigê xwe biavêje tune ye. Ji bajarên dorhêlê jî bi hezaran xelk tên, li wir xwarinê çêdikin, dixun û dîlanan li dar dixin, heta êvaran kêfê dikin û bi dû re vedigerin. Wir çi hênik û xweş bû. Her der av, dar, gul û repin

bûn. Bîhik serê xwe di nav avê dadikin. Masî xwe ji nav avê bilind dikin û dîsa dadikevin. Xortan xwe tazî dikirin û diketin avê. Welehî mezin jî hebûn. Rê li hemû deverên bexçe gerandine, li dora rêyan çam çandine û
wek rîha wî melê ko mala wî li serê kuçê ye, wilo rast û spehî qusandine; şaxek ji yên din ne dirêjtir e...«
»Qala rîha melê neke kurê min, guneh e« Xanimê bi lez got, lê Sarê di ber xwe de dibeşişî.
»Min ne ji xerabiyekê got yedê, wek rîha wî xweşik bû. Navê wir çi bû Sarê, xwedeh tu ka dîsa bibêj...«
»Berac.«
»Erê lê, Berac... heger ez bikaribim, ez ê her salê herim wir. Min ji serxetê hez kir. Digotin serxetî di xewê de mane, derengketî ne, lê na bavo. Xortên wir wek ên Kuba ne, nizanin bê tirs çi ye, hindik maye erdan li xizanan belav bikin û welêt azad bikin. Ez ê her salê herim serxetê.«
»De ka ko tu bi xêr bibî zavê mala bavê min, tu dê sedema ko her salê

herî wir bibînî« Sarê got û hinêkî keniya. Tiştê ko Seîd digot, sedema serbilindiyeke bêhempa bû.
Wek ko Seîd bibêje kaaa, li Sarê nerî, serê xwe carekê duduyan bi jêr û jor de hêdîka hejand û di bin simbêlan re beşişî. Ji rengê rûyê wî xuyabû ko tiştê di dilê wî jî de, ew bû. Sarê, carinan gotinên wek bizmarên ko li deppekî nerm rast bên digotin. Te digot ko bi rojan ramiyaye bê wê çi bibêje û dawiya dawîn ew gotin li hevdu anine. Carinan tiştên wilo, ji ber xwe ve jê re li hevdu dihatin.
»Kurê min welehî min jî navê wir bihîstiye, lê min nediye. Te çû wir

dît.. xwezî bi dilê te... ma mirov nikare ji xwe re li bin darekê, li ser repin rûne û xwe rehet bike, ya jî di wê hênikayiyê de xeweke xweş li bin darekê bike?«
»Çawa mirov nikare yadê. Wê bedena te bi hilm û bêhn û hênikaya daran û avê rehet biba. Ma ne te wir diye Sarê?
»Çawa min nedîtiye keko. Min hezar caran dîtiye.«
»Ax, Xwedêyo, wir çiqasî xweş bû« Seîd got.
Hîna nû dest bi axavtinê kiribûn, wê hîna qala bajêr û hezar tiştên din bikirina, lê Hiso ket derî. Hemû bi carekê re ji ber rabûn û cîhê rûniştinê jê re çêkirin. Xwe li ser cilikê, li tenişta Xanimê duta kir û rûnişt. Xêrhatin da Seîd û ji Hecî Elî dest pê kir û li halê wan û kêfa wan pirsî.
»Gelek silavên Hecî Elî li te hene. Bibêje bavê xwe bila bê, em ê dîsa herin avgermê û bi dû re em ê herin Weyselqaranî û hemû ziyaretên din, em ê têra xwe bigerin. Em ê ba û êşên di bedena xwe de dîsa ji xwe daweşinin û xwe rehet bikin. Ji zû ve ye nehatiye. Bila carekê bê digot. Gelek silav li te dikirin«.
»Waa. Nexwe Hecî hîna ew ger ji bîra nekiriye. Hîna ji zû ve ez û ew carekê çûbûn li wan deran geriyabûn. Welehî gereke xweş bû. De ka em ê binerin. Heger xwedê destûrê bide, ez ê dîsa herim«.
Sarê bi taseke ava sar hat ba Hiso. »Wey xwedê ji te razî be keça min« got, simbêlên xwe zuwa kirin û »ma Hecî Elî çawa ye, hîna li ser xwe ye« got.
»Hecî li ser xwe ye. Wek xortekî ye, hîna diçe karê xwe û tu gazinan ji tu derên xwe nake.«
»Wilo ye, Hecî xurt e û saxlem e. Heta cara dawîn ko min ew dît jî, hîna rojeke tenê jî nexweş neketibû. Û bi gelekî ji min biçûktir e. Ew ne wek min e, ez mezin im.«
Derî vebû û Ebû Ferîd hat. Seîd û Sarê ji ber rabûn, Sarê kursiyek

kişand tenişta Hiso û ew li wir da rûniştin. Sarê dîsa bi ava sar ve beziya û bi taseke mezin zû vegeriya. Ebû Ferîd jî ket nav qisetê. Hêdî hêdî ji hev re digotin û xweş dikirin. Sarê li aşxanê diçû û dihat, sifre rû dikir. Tavilê derket ba wan û »firavîn hazir e, fermo, hûn dikarin li hûndur jî ji xwe re biaxivin« got.
Hiso û Xanimê herduyan bi hevdu re, »baş e kaça min, em ê aniha ra-bin« gotin. Hema bi dû re, »de ka em rabin, em ê li hundur biaxivin« Hiso got û da xwe.
Xanimê da dû wî û ên din ji li gor temenê xwe bi dû wan de rêz bûn û çûn hundur. Wek her carê bi malbatî girtin ser firavînê. Sarê, zarok dan pêşiya xwe û dawiya hemû kesan ket hundur.
Seîd, gotin di derheqa Hecî Elî û halê wî de digirt. Dixwest ko dêya wî, piştî ko ew bi xwe derkeve, ji nû ve xwestina dilê wî ji bavê wî û Ebû Ferîd re rave bike. Piştî firavînê, zû rabû derket, çû mala Silo.
Hiso, hinekî din bahsa xwe û Hecî Elî kir. Destbirakiya wan kevn e, çîroka wan dirêj e. Lê a Hecî Elî bi xwe hîn dirêjtir e.
Berî gotina çîroka Hecî Elî, divê bahsa êvarê jî bê kirin. Divê bê eşk-erekirin bê çi li mala Şemê bû û çi nebû. Wê êvarê Seîd şîv xwar û dîsa berî ko gotin here ser karê ko pê çûbû serxetê, rabû ser xwe. Gava sola xwe
kir nigê xwe, karê min bi Silo heye, ez ê herim wir got û çû.
Wê êvarê, ji reva Seîd, ji wê kurte bêdengiya ko girtibû ser malê, ji liv û mereqdariya Hiso û Ebû Ferîd, ji awirên Xanimê, ji xiroşa ko Sarê ketibûye, eşkere dibû bê êdî divê çi bikin. Bêhn û giranî û xiroşa tiştê ko wê bikirana ketibû hewê. Lê her tişt li ser xênî pir eşkeretir in. Ev yek ji sed salan ve wilo ye. Dinya, ezmanê bi stêrikan xemilî, ba, hênikayî û

mebesta dilan... hemû li wir eşkeretir in. Ji sed salan ve bav û kal şevên havînên germ li ser xaniyan rûniştine, şevbuhêrk û civat gerandine, şêwir girêdane û bi dû re jî raketine. Mala Şemê jî ji roja ko hatine Qamîşlokê, her wilo kirine. Wê êvarê jî wilo kirin.
Lê wê êvarê taybetiyek di sedema rûniştina wan de hebû. Wê êvarê şêwreke wan a girîng hebû. Loma jî wê êvarê, piştî şîvê, wek dema endamên dadgeha engîzîsyonê ciyê xwe digirin, bêyî ko tu kes ji wan dereng bimînin, hemû derketin li ser xênî, li ciyê xwe rûniştin û xwe ji axavtinê re amade kirin.
Hiso Înkvîsîtorê mezin bû, Ebû Ferîd ê duyem bû, Xanimê dawedar bû û Sarê bi xwe jî endama şewrê û darezana mijarê bû.
Tavilê Xanimê dest bi gotara xwe kir. Pêşî bahsa ko Seîd, Gulê ece-

bandiye û dildikin herin wê jê re bixwazin kir û bi dû re pirsyara bê ka wê çawa wî karî çareser bikin kir û êdî gotin sipart Hiso û Ebû Ferîd. Lê berî wan, wê li gotina xwe zêde kir û got ko divê wilo bikin, da bikaribin heta payîzê wê bînin. Wan jî bi dorê gotina xwe kirin û li hevdu vegerandin. Pêşniyara wê dihat ecibandin. Carê Sarê û dîsa jî Xanimê xwe tev li gotinê kirin, bi dû re hemûyan li gotina hevdu ya dawîn pirsîn û hevdu baş li ber xistin. Biryar dan ko wê Gulê ji Seîd re bixwazin. Tavilê Xanimê, »mala xwedê ava, va min ev roj jî dît. Îcar ez bimrim jî xem nake« got. Êdî şev hatibû piştî eşa. Xweşî diket şevê. Bayekî hênik û nerm, rawesta wê germa mirinê di hewayê de hildiweşand, can û lebat û hênikbûn didayê, deng bi herdu tûyan dixist û konsera gitara Rodrigo li dar dixist û derbas dibû diçû jêrtir. Wê êvarê ba, geh ji bakur bû û geh jî ji başûr bû. Çiyan û dinya hênik dilovanî û merdî dikir, lê tiştê ko xuya dibû, Sahra

Ereban qebûl nedikir, dîsa bêhnteng bûbû û dixwest xezebê û bayê germ bi ser bajêr de birijîne, lê heta ko digiha wir, nerm û sist dibû û li wir, êdî dimir. Wê êvarê tu desthilanîn nedikir. Pir hindik caran gihabû heta ba mala Şemê. Lê bayê ko ji hêla çiyan, ji hêla zozanên hênik dihat, derbas dibû, heta wan jêran. Bi piranî ew li başûrê bajêr digirt û ji nû ve ji qewetê diket û dimir. Gava ba ji çiyan dihat, bêhna dar û bexçan jî bi xwe re di-anî û bi ser bajarê Qamîşlo werdikir. Bêhna şewatê jî di hewayê nemabû. Dema lebat diket bê, Hiso bi esehiya baweriya nêriyê ko di bêhna bizinê derxe, tê derdixist û bêyî ko dereng bimîne »ox! îşev çi bêhna xweş di hewê de heye, bêhna çiyan e, a dar û bexçan e« digot. Xanimê piştgiriya gotina wî dikir û ji ên din dipirsî bê ma ne rast e. Ên din jî »erê welehî bêhneke xweş e« digotin û dîsa li gotina xwe vedigeriyan. Hêdî hêdî di ber hev re digotin û ji hev re xweş dikirin.

Li maleke ji malên tenişta mala melê rîhxweşik, dîlaneke bê tembûrvan hebû. Li ber teypê dikirin. Lê li taxa di binya wan re, Seîdo dawet xweş gerandibû û deng bi ser çend taxan dixist. Li nêzîktirê sûkê jî Selaho lê dixist. Heçê Xidirê Omerî bû, wî şeva çûyî a xwe xelas kiribû. Wî li taxa di binya kuça mezin re, ji Omeriyan re lê dixist. Li pişt xênî, li wê devera vala, du çirçirkan dabûn ber hevdu û digotin. Li ser xaniyekî ji wanên ro-java, dengê pisîkekê jî di navinan re dihat. Dengê ji ber yeke din bû. Li ser tûyê, carnan çîzînî ji çûkan dihat. Diyar bû ko hin ji wan pir nêzîkî hevdu bûn û nikil ji hevdu didan.

Lempeyeke mala Şemê li ser xênî hebû. Xeteke tazî kişandibûn ser xênî û bi darekî ve daliqandibûn; êvarên reş pêdixistin. Şeveke reş bû. Şev, şe-

va civanên dildaran bû. Wê hîv derengê şevê derbiketa. Ezmanê tarî hîna tijê stêrik bû. Wek ko stêrikên ezmên hemû wê êvarê di ser herdu bajaran

re rawestiyabûn. Carê di navnan re yekê ji aliyekî ezmên dest pê dikir û dirijiya heta aliyê din. Bi çi lezê dibû, çi ji nifşkê ve dibû! Ezman hemû xemgîn dibû. Ma kî dizanê, belkî jî êşeke mezin dikişand. Belkî birîneke din di gerdûnê de vedibû û kuleke din diket aramiya wê. Lê heçê Hirçê bû, di ewlehiyê de, bi bejin û bala xwe ya delal, wek ko ji sedhezarsalan ve
kiribû, li rasta çiyan pir dilgeş xuya dikir. Pişta xwe dabû Castor û Polux û destê xwe dirêjî Arcturus kiribû, ew bi nazdarî gazî şevê dikir. Herculesê bi zend û bend pir dûr bû, ew nedidît. Li hêla din, rêya kayê, wek çemekî ji zîvê hilandî, ji seriyekî ezmên heta seriyê din diçû. Rengê geşiya ezmanê pak û fireh bû. Dikeniya. Gelo, mala kîjan dilgeşan li wir bû! Gelo kîjan dilgeşan ji wir temaşe dîlanên Qamîşlokiyan dikirin! Gelo kî û kî di destê hev de li ber wan direqisîn! Dengê Seîdo ji wir vedigeriya taxa Qudûr Beg. Sarê xeyal dikir ko wê ji rojan rojeke ne pir dûr, ji bo Gulê û Seîd, li ber deriyê wan jî dîlaneke wilo mezin bigerine.
Wê êvarê, berî ko malbat ji bo razanê biçe ser nivînan, dîsa ji Ebû Ferîd re hat gotin bê divê çi bike û çi neke. Dîsa rêya ba Ebû Merwan ji bo wî xuya dikir. Lê êdî karîbû û xweş zanîbû bê ev kar çawa dibin.
***
Hecî Elî, bi eslê xwe ne Nisêbînî ye. Ji zû ve, ji gundê Kerbedewan, gundekî dora qeza Midyadê, ji ber bavê xwe barkiriye Nisêbînê. Bavê wî jê dixwest ko bibe keleşekî nav gund. Lê wî nedixwest û nedibû. Ji ber vê yekê jî, navê wî bi tirsonekiyê derxistibû.
wê rewşê, bi salan ajotibû. Êdî qîmetê Elî li Kerbedewan daketibû pênc peran. Gotina wî nema li ba tu kesan pere dikir. Hemê ji ser pişta wî danediket û wî bi a wî nedikir. Her ji du rojan karê Elî û bavê wî ew bû û deng diçû gundiyan hemûyan. Êdî Elî, di çavên mêran, pîrekan û zarokan de tirsonekekî mirî bû.

Hemê, Elî ji ber wilo nedizewicand jî. »Bila tovê pîs û tirsonekan ji dinyê biqele« digot. Lê bi reca melê û çend camêrên din hatibû rayê û ew dereng jî be, a soxî zewicandibû.
Rojeke payizê ber esir, gava Hemê nû ji nav teşqelên derve ketibû hundur, dîsa dest bi pevçûnê kiribû û xwe bezandibû Elî, tavilê xwe nema girtibû, biryara ko ji gund barbike dabû. Pêşî çûbûn gundê mala bavê

Stiyê. Piştî çend rojekî kerê wan û hinek pere ji wan deyn kiribûn û xwe gihandibûn Midyadê. Çend mehên çile li wir mabûn û bi dû re hatibûn Nisêbînê.
Sala pêşî, heger gotin bê hewedarî bê gotin, halê wan halê kûçikan bû, bi zikekî birçî, bi yekî têr sal buhartibûn. Wî wextî ji ber tunebûnê, cixare jî terikandibû. Gava dû re ber xwe dîtibû jî, dîsa dest bi cixarê nekiribû. Elî, pêşî li ser têlan barkêşî kiribû û bi dû re jî karê ko hîna jî dike dîtibû. Karê wî bi hêsanî çêbûbû. Jê re gotibûn »ma tu bi nivîsandinê û xwendinê dizanî?« dema Elî gotibû »erê«, jê re, »de ne xwe baş e Elî, hema sibe wer dest bi kar bike« gotibûn. Piştî wê îcar karê wî rast bûbû.
Hîna gava dor dusalekî tenê bi ser barkirina wî ketibûn, Kerbedewî lê poşman bûbûn û çûbûn dû, xwestibûn wî dîsa li gund vegerînin. Lê Elî ji wan re bahsa karê xwe, xweşiya ko ketibûyê û Nisêbînê kiribû û ew vala vegerandibûn.
Piştî wê bi çend salan îcar Hemê miribû. Seroxanê birayê wî şandibû dû, lê Elî dîsa neçûbû. »Bavekî min ê wilo tune ye« gotibû.
Dema dor hatibû parvekirina milkan, Seroxan dîsa şandibû dû, lê Elî dîsa neçûbû. Wî wextî hîna şeş heft sal bi ser barkirina wî ketibûn. Hîna dilşkestî û xeyidî bû. Di ciwaba ko ji Seroxan re şandibû de, »ez ne li

bendî tiştekî me, lê heger tiştin para min bikevin, hima mele wekîlê min« gotibû. Lê piştî çend salekî, dema îcar dêya wî miribû, çûbû çend rojan li Kerbedewan mabû û careke din jî qet nema çûbû.
Seroxan, milk li ser destê melê par vekiribûn. Hinek erdê bej û çend cot rez para Elî ketibûn. Li gor parvekirina melê, xanî jî yê herduyan bû. Lê xanî dabû Seroxan û para xwe ya milkan jî firotibû pismamên xwe. Bi wan peran, li Nisêbînê, di nabêra çem û rêya ko ji bajêr hildikişe dahla Bûnisra de, li terefê bajêr, erdekî mezin kirîbû. Pir erzan kirîbû û xaniyê xwe yê niha, di nava wî de çêkiribû. Xelkê »tu dûr dikevî, tu perên xwe diavêjî« jê re gotibûn, lê wî, »wê bajar bi wir de mezin bibe, hûn ê bibînin ji niha û çend salên din, wê wir bi zêran jî neyê kirîn« gotibû. Wilo der-ketibû. Niha xaniyê wî di nava hewşeke mezin de ye. Bajar çûye û ew der-bas kiriye. Buhayê wir bilind bûye. Îro êdî dewlet nikare xaniyekî wilo, li wir çêbike.
Çend darên ko di hewşê de çandibûn jî êdî mezin bûbûn. Du dêliyên mezin jî di hewşê de hebûn. Her salê tirî bi ser herdu dêliyan de dirijiya. Yek xelas dibû, a din çêdibû. Li qorziya aliyê rojava yê hewşê jî, her salê mişareke bacan, yeke îsot, yeke bacanên reş, yeke xiyar, yeke tirozî, dudu

pîvaz û yeke bexdenûs diçandin. Çile jî lehane, pîvazterk, tivir û silk diçandin. Ji ber wê yekê, qet dor nedihat xerckirina peran a li sûkê, di cîhê xwe de diman. Kêfeke belek dikir.
Êdî tê derxistibû ko divê mirov xwe him di baweriyê de û him jî heger hewce be di jîna rojane de li hemberî xelkê bi dest û lepan jî biparêze. Roja ko tê derxistibû ko divê ji Kerbedewan bar bike, »xuya ye mercên jînê wilo ne«, ji xwe re gotibû û wilo jiyabû. Ji ber wê yekê, bû wek gurekî birçî û ket dû zefkirina lixavên jînê. Girtibû û bernedida.

Dibêjin ko bajar derya ne, hin bi ser dikevin û hin jî di nav de difetisin. Lê piştî ko Elî bûbû xwediyê baweriyeke wek a guran, diviyabû bi ser biketa. Li Nisêbîne bi ser ketibû. Di çend salekî de hêdî hêdî jê re baştir ketibû. Êdî wilo bûbû ko li jîna çûyî poşman bûbû. Li ber emrê ko di ber pitpita Hemê de buhartibûn diket. Jîna bajêr bi her awayên xwe, ji a gund xweştir bû. Karê wî hebû û pere diketin destên wî. Xwedê lawek jî dabû wan û êdî ew ji wan re hiştibû. Û her ko diçû, destên wî firehtir dibûn, halê wî xweştir dibû û zarok lê pirtir dibûn. Stiyê, di wextê xwe de, di vatiniya xwe ya anîna zarokan de dereng ketibû. Lê jineke bi bereket bû, yazdeh zarok anîbûn. Xwedê sisê dîsa ji wan stendibûn û heşt jî hiştibûn. Sax hemû bi hêsanî mezin kiribûn.
Hecî Xêredîn ê mezin bû. Hecî Xêredîn bi jin bû û çar zarokên wî hebûn. Hecî Elî ew zû zewicandibû û ji malê cihê bû. Berî heft salan Hecî Elî xaniyek jê re kirîbû, dikanek jê re vekiribû û ew ji malê cihê kiribû. Abora zarokên wî êdî wilo dibû. Bi dû serê Xêredîn re Sarê û Medîna di-hatin. Sarê gihabû binxetiyan û Medîna jî li Enqerê bû. Mêrê wê li wir kar dîtibû û barkiribûn wir. Enqera pir dûr bû, rêya wan pir bi welêt nediket. Bi dû serê Medîna re jî Ûsiv, Sêvê, Gulê, Kamûran û Selma di-hatin.
Li Nisêbînê ji Elî re li hevdu hatibû. Piştî ko ji gund barkiribû, rojên xizaniyê û her babet qiriktahliyê jê bi dûrtir diketin û ên xweş nêzîktir dibûn, jiyan jê re baştir û baştir dibû. Êdî ew bi xwe jî fêrî derxistina per-an bûbû. Di ber karê xwe yê fermî re, hêdî hêdî fêrî çandina pembo jî bûbû. Dîtibû ko karekî hêsan û bi feyde ye. Û rast hisab kiribû, lê dîsa jî salinan dikir û salinan nedikir. Zarok hûr bûn, pê re nedigiha.
Erê Elî ne pir dewlemend bû, nîvhalxweşekî ne pir li ber çavan bû, lê ji roja ko dest bi çandiniya pembo kiribû û pê ve, êdî baş perên wî çêbûbûn. Berî bi çend salekî, li nêzîkî sûka bajêr, rêzeke dikan û li ser wan jî

xaniyekî din ava kiribû. Xaniyekî delal bû, midîrekî mezin tê de bû.
151
SORÊ GULÊ

Lê wî, xwe ji dewlemendan hisab dikir û pêşî bi awayekî ne pir ewle, lê dû re, bi lebateke eşkere nirxekî ji yê xwe bilindtir li xwe dikir. Helwesta wî ya »min got, xebera min e û rast e«, bi çêbûna perên wî re pê re qewîntir bûbû. Êdî ji gotina ko digot danediket, diviyabû wek wî bibe. Ji xwe di malê de tiştê ko bigota, diviyabû bibe. Hêdî hêdî nizmdîtina xizanan jî li ba wî peyda bûbû. Lê gava xwedê karê hinan li hevdu tîne û dide wan, li vê yekê nanere. Dide û her dide.
Elî heta niha du caran çûye mala xwedê tewaf kiriye û bûye hecî. Bi wî awayî qedrê wî di civatê de pirtir bûye, hejmara ên ko li sûkan û li ber dikanan ji ber radibin û li gotina wî guhdar dikin pirtir bûye. Êdî navê wî jî nema Elî tenê ye. Hecî Elî ye. Soz daye Stiyê ko wê carekê wê jî bibe Hecê. Xwedê dida wî û wî jî dîsa dida xwedê. Wî û xwedê wilo li hevdu dikirin.
Lê ji bo ko xwedê bida, xebateke ji dil hewce bû. Ji demekê ve bû herdu kar di ber hev re dikirin; êdî her salê dikir. Him karê xwe yê li daîra dewletê dikir û him jî pembo diçand. Hatina wî ya ji karmendiya wî, heger ko tu nexweşî û belên mezin nehatina serê hinan ji wan, têra xerciya wan a malê dikir. Ên ko ji pembo jî dihatin, li cîhekî hiltanîn. Li gor ko dihat gotin, li ba dikandarekî dost bûn, jê re dişixulandin û mîktara wan, sal bi sal, ji nû ve di rûpelekî tênûsa bêrîka xwe de dinivîsand. Hecî Elî wek xelkê perên xwe bi selefê nedidan, lê li gor navê kuwî bi xwe li kirina xwe dikir »li ba dostekî wî yê dikandar jê re lê zêde dibûn«. Ê dikandar kî bû, ne kî bû, bi esehî nedihat zanîn, lê tiştê ko dihat zanîn, ko wî û Hecî Elî di vê derheqê de bazareke baş kiribûn.

Mêrik pere dixebitandin û li wan zêde dibû. Nîvê dikanê bi perên Hecî Elî bû. Lê ji tiştê ko bi ser diket, serê sedî sîh, para wî bû. »Gava bazar wi-lo be, ne selef bû û ne karekî guneh bû« digot. Her sê keçên xwe yên mezin jî bi dorê dabûn û hinek ji qelenê wan, hîna jî li cîhekî ewle, ji pereyên xwe yên din cuda hilanîbûn. »Ew ne wek ên ko mirov bi keda xwe dicivîne ser hev pak in; ew ji Hec, mûlid û xerciyên rojiyê re qet nabin« digot. Lê bi qismê mezin ji wan peran, xaniyê xwe yê li nêzîktirê nava bajêr ava kiribû. Hecî Elî, »ji ber ko qelen êdî bûye xanî û dikan, pereyên ko ji kirê tên, nema hatiniyeke ji qelen e, helal in« digot. Mele Mislimê dostê wî pir zane bû, fitû bi wî awayî jê re dîtibû.
Hecî, xwe û zarokên xwe ji tiştên ko pêwîst bûn mahrûm nedikir, lê dîsa jî li gor baweriya hin hevalên wî yên kar, xerciya wî ne pir bû, hindik bû. Hinan jê rewşa wî dibirin heta nêzîkî xesîsiyê jî. Lê li gor wî, li derve,

kirina xerciya zêde, guneh bû. Ew di mala xwe de, ji mêvanan re merdekî mêran bû.
Dengên hevalên wî yên kar diçûnê, lê wî guh nedida wan. Ew di doşa xwe de nedidîtin. Hevalên wî yên wekî din hebûn, gotina wan li ba Hecî Elî pere dianî. Ew mezin bûn, xwedî pembo û gund bûn. Ew cuda û bilind bûn. Hecî Ehmedê Gundikî yek ji dostên wî bû. Zilamekî bi malê dinyê xurt bû û di civatê de xwedî desthilateke bi saw bû. Li gor ko xelkê bawer dikir, tiştekî ko ji bo peran nekira, tune bû. Tiştekî ko ji destê wî nehata, tunebû. Çi sala ko sêhra rojana tevrikê dihat danîn, ew xwediyê gotineke giran bû. Çawîşên palan, wek ko cin ji hesin ditirsin, jê ditir-siyan.
***
Hecî Ehmed, roja sêyem a rawestandina tevrikê, piştî limêja esir, ji bo ko

rewşa ji tofanê bi çavên serê xwe bibîne, li tirimpêla xwe suwar bû û çû nav pembo. Li seriyekî rawestiya û awira xwe bi keder li ser gerand. Tiştê ko wê jê bihata hisab dikir. »Malê dinyayekê ye, lê ê Hêştirekî û sêlekên xelkê dixwazin hemûyî hişk bikin« ji xwe re got. Ji xwe roja ko wê pale berdana nav û tevir bida, kar hatibû rawestandin. Hecî Ehmed di deriyekî teng de hatibû girtin. Buhust û nivê bilind bûbû, lê wê hemû bi axê de biçûya. Û »wê wê tevrikê bi xwe, berê pembo bikira du qat«. Lê nedihiştin. Vê germê, rojek ji bo pembo bi gelekî bû. Sê rojên germa cehnemê lê çûbûn. Rojê nema zanim bê çend ton lê dişkestin. »Hemû pere ne, perên pir in. Wê di hefteyekê de hemû bihata tevirdan û ji eşêfê bihata pakkirin. Bi dû re jî îcar wê bihata avdan. Axx! wê bifûriya, wê bigihişta ser kabê« got. Lê didît ko eşêf buhustekê rabûye û serê tayên pembo ji bêavbûnê xiliyane nav şax û perên eşêfa zalim. Serposka xwe di nav axê hilda, dît ko axa diviyabû rewê bide pembo, ji bêavbûnê buhurtiye. Qelşên ko lê ketibûn, li ber çavên wî dibûn wek devên tirbên li bendî wî bi xwe. Dilê wî hat givaştin û tama tahliya mirinê da ser dev û lêvên wî. Ji qahran çavên wî bûbûn wek du sersotan. Îmana ko pê re hebû hemû di serê bêvila wî re derket û çû. Bi leza gunehkar û keleşan li xwe fitilî û berê xwe da rê ko here. Wî çaxî dît ko Tajdînê keraxê wî jî bi mitale û stuxwar, çend metroyan dûrî wî, li pişt wî ye. Tê derxistibû ko bêhna Hecî bûye wek dema mirov îsota tûj bixwe. Ji ber wê yekê newêrîbû xwe tev bide û deng ji xwe derbixe. Gava Hecî di ber re çû ba tirimpêla xwe, silava xwedê

jî lê nekir. Ji bahcan bê dîn û bê îman bûbû. Gava deriyê wê mersedesa delal ko di bin roja esir de diçirisand li xwe girt, hindik mabû ko ji hevdu de bixe. Ew tirimpêla delal, bi wî rengê xwe yê sor, di nav derya pemboyê

kesk de, wek ko guleke bi tenê, di serê darê de xuya bike bû. Gava nalîn bi motorê wê ket û ket rê, lastîkên wê, pêşî du fitlan di cîhê xwe de fitilîn û ji nû ve meşiya. Axa rê buhustekê kola, toza dinyayekê bi dû xwe xist û çû. Xwedê rîha bavê Tajdîn sitirand ko hinek lebat ji hêla rojhilat ve di bê de hebû, toz hêdîka ber bi aliyê din de qulipand. Lê dîsa jî bêhna axa cûtî, wek bêhna pîşo tûj û eşkere, di nav hemû bêhnan re çû û ket bêvila wî. Tajdîn karîbû bêhna axê ji nav hezar bêhnan derxe û nas bike. Bêhna lastîkan û benzîna şewitî jî, bêhneke mir û tûj kiribû hewê.
Hecî Ehmed, bi wê lezê rast çû bajêr, ba mala Sebriyê Ûsivê Medê. Ên ko ew bi rê de didîtin, »bi xwedê Hecî Ehmed araq vexwariye... ma ko ne araq vexwarî be, mirov tirimpêlê wilo dajo camêr. Wek dîna dajo« ji hev-du re digotin. Hinan jî »hebe nebe hin ji mala Hecî Ehmed nexweşên gi-ran in, wê here doktor bigihîne ser wan, ji ber wê yekê wilo bi lez dajo« digotin.
Elî, Serdar, Misto û Izzet li ber dikana Celîlo rûniştibûn û çayê vedixwarin. Celîlo camêrekî ko ji xwendevanan hez dikir bû. Ew û Elî baş dost bûn. Çi dema ko Elî ji xwendinê dihat, çend carekî ser didan Celîlo. Wê êvarê dîsa serdaneke wilo bi dostên xwe re dikir. Dîtin bê Hecî Ehmed bi çi xezebê derbas bû. Xwedê rîha bavê wan sitirand ko kamyona avê ya belediyê nû rê avreşandî kiribû, toz ranebû. Bêhna axa şil
ketibû sûkê. Gava Hecî derbas bû, bi hevdu re bi dû de nerîn lê tu mane nedan wê ajotina wî. Misto di sedema leza wî derxist: »hûn dibînin... bûye wek hirçê ko mirov êgir bi qûna wî veke... çawa wek dînan diajo. Çaxê ko mirovên bitir aciz dibin, wilo dibin. Bûye suwarê wê mersedesa delal, lê hîna benzînê û gazê ji hev nas nake. Ax! Dewlemendiya bi hêsanî û ji nifşkê ve û nezanî çiqasî li hev nakin. Wek çêleka di kirasê bûkan de ye. (hemû bi dengê bilind keniyan) Ez wê rojê wilo rasthatinî di ber ben-

zînxanê re derbas bûm, ew jî li wir bû û bi qûretî ji yê ko li ber benzînx-anê bû re, »tirimpêla min tije gaz bike, zû, li min dereng e« digot. Heta ez derbas bûm jî, herduyan li ber hevdu didan bê ma divê gazê, ya jî benzînê berde tirimpêlê« got.
»Ew kî bû, Misto« Serdar pirsî.
»Hecî Ehmedê Gundikî bû. Ma tu wî ji wê tirimpêla delal jî nasnakî malava. Ma çend bi wî rengî li vî bajarî hene? Ma ne li nav pemboyê wî

bû demançe li me kişandin? Tu ka bila du rojên din jî herin, welehî wê li sûk û kuçan bigirîn û bikin hewar«.
»Ew bû ha«.
»Er ê welehî ew bû. Ax, ew tirimpêla delal... heger mirov bi yeke wilo here Enqera û Stembolê... hûn ê bibînin bê xezalên nûgihayî çawa tên dora mirov digirin« got û li Elî nerî. Elî û ên din hinekî di ber xwe de keniyan. Elî di ber ken re »wilo ye Misto. Ew jî bi perên ko bi taba me xe-batkaran hatiye çêkirin û kirîn e... tu dibînî. Bi dû re jî dilê me pê bi me dişewitînin« got.
»Rast e, lê ev bitirî ji wan re namîne... heger em bên ser hukum, em dizanin bê em çi dikin«.
»Wê ew roj bê« Elî got.
Hecî rast ajot ber deriyê Sebriyê Ûsivê Medê. Fûadê lawê wî li hewşê, li ser kursiyekê bû û li kovareke rengîn dinerî. Dema Hecî Ehmed ket hewşê, kovara xwe li hevdu pêça û rabû ser xwe.
»Ma bavê te li mal e«.
»Erê apê Hecî«.
»Ha ji te re mifta tirimpêla min... here Zahirê Hesen Çawîş, Hecî Mahmûdê Diranzêran û Hemê Hûran werîn û wer. Bibêje, bavê min û

apê min Hecî Ehmed gazî we dikin. Aliyekî serê wan qusandî yek hiştî bi-la bên. Wî Hecî Xerabê Kurîsan jî werîn. Mala wî jî li ba mala Hemê Hûran e« got.
Fûad bi kêfxweşî berê xwe da deriyê hewşê û çû. Bi wê tirimpêla delal, wek bê li sûka bajêr xist. Li deverên ko zuwa bûbûn, toz bi sûkê xist. Berçavkeke reş a rojê dabû ber çavên xwe û di tirimpêlê de heta ko karîbû xwe bi paş de pal dabû. Cama ba xwe vekiribû û enîşka xwe buhustekê tê re derxistibû. Xelkê, heta ko bi çavan xuya dikir, bi dilşewatî bi dû de din-erîn. Li vegerê jî bi wê qapaniyê û lezê ajot. Kuçe zuwatir bûbû, sûk bi dû xwe de tije toz û dûman kir.
Fûad, hîna nîvsaetek neçûbû, Hecî Mahmûdê Diranzêran ne tê de, lê ên din hemû anîn. Dema ketin derî û hedî hêdî derbasî hundur bûn, Fûad tenê li ber derî li ber çavên Hecî Ehmed ket û got: »here Remo, Xidir û Ehmê Cemîlo jî werîn. Heger xwe bidin vî alî û wî alî, ji wan re, »bi qesem apê min Hecî nahêle li we bibe sibeh, bibêj«.
Hecî Xerab hîna li ser nigan bû, dev li zimanê xwe kir û berî ko Hecî Ehmed tiştinan ji wî re jî bibêje, zû rûnişt.
Fûad çû û hersê çawîş jî di nîvsaetê de anîn ber destê Hecî Ehmed û ên
155
SORÊ GULÊ

din. Reng ji wan çûbû, bûbûn wek şimmê. Ji silava xwedê pê ve, gotin ji devê wan derneket û li nêzîkî derî, li ser xalîçeke ko pirça wê wek repinê buharan bilind bû, hêdîka xwe berdan ser kaban û man. Bi sûcê xwe zanîbûn. Fedîkar bûn. Xidir û Ehmê Cemîlo serê xwe berdabûn ber xwe û destê xwe di pirça xalîçê didan. Serê Remo ji nizmbûnê bilindtir bû û li bendî pirsan bû. Hecî Ehmed bi ser wan de qîriya:
»Hûn bi sûcê xwe dizanin ne wilo«.

»Zor li me kirin Hecî, bi wê heca ko tu çûyê, me nedixwest ko wilo bibe, lê welehî wê em bikuştina« Remo got.
Ehmê Cemîlo ser temam kir: »welehî me xwest ko em xwe tev li tifaqa wan nekin, lê zor li me kirin.«
Hecî dengê xwe bilintir kir: »wey xwedê ruhê we bistîne. Hûn çi tir-sonekên mirî ne. Min nedihişt ko destê wan bigihije we. Lê we çû xwe ji sêlekan û fitnan tirsand«.
Sebriyo dît ko bi darê Heci nagihijin tu deran. Gotin ji devê wî girt: »tu ka raweste Hecî, tiştê çû çû« got û berê xwe da çawîşan. »Ma çiqasî dixwazin«.
»Welehî wê dor pazdeh lîran bixwazin« Remo got.
»Pazdeh lîre« hemûyan bi hevdu re gotin. Hecî Xerab »em vî qase karî dikin, lê em dîsa çar weqatê salê bi hesreta qurûşan in, na lo, bila bên malê
me tevî ji xwe re bibin... ev talanî ye. Ma ji xwedê jî natirsin...«
»Ka tu raweste Hecî Xerab« Hecî Ehmed got. »Bi wê Heca ko ez çûmê, ez ê îşev herim gundên Midyadê û çi xerabê ko heye bînim vî bajarî. Ez ê bikim ko deh mêran li erdê raxin. Ez ê bikim ko pêşî we hersêyan bi gu-lan bikin serad. Ma em li serê çiyan in ko dixwazin me ji xwe re wilo tazî bikin. Du lîre û nîv û ne qurûşekî din. Pazdeh lîre!... ma em ê çi bixwin?«
»Hecî ez xulamê te me bêhna xwe hinekî fireh bik, em ê bi bêhnfirehî rêyekê bibînin. Tu çima xwe aciz dikî xwedê ji te razî« Remo got.
»Erê lo Hecî... tu ka bêhna xwe fireh bike... îro çi bi te hatiye... tu caran tu wilo bênhteng nebûye. Ka raweste, vaye camêr hatine, em ê bi hev re bikaribin deriyekî xêrê vekin« Sebriyo got.
Zahirê Hesen Çawîş xwe avêt nav: »xebera Sebriyo ye, bêhna xwe fireh bike Hecî Ehmed«.
»Ma bêhnfirehî bi kêrî çi tê xwedê ji we razî? Xuya ye hûn neçûne û we

nediye bê ew pemboyê delal ketiye çi halan. Dike ko hişk bibe hûn radib-in ji min dixwazin ko ez bêhna xwe fireh bikim«.
»Weleh tu çi bikî heqê te heye« Ehmê Cemîlo got.
156 SORÊ GULÊ

Sebriyo berê xwe da Hecî û got, »Hecî, em ê penc lîran bidin û bila sibe bên dest bi karê xwe bikin«.
»Penc lîre gelekin bavo, ma hûn çawa hisab dikin«.
»Xem nake Hecî... ew jî guneh in, bila xêra miriyên me be« Zahirê Hesen çawîş got.
Sebriyo gotina wî dubare kir û got: »erê lo«.
»Weleh pênc lîre gelek in, lê ma em çawa bikin, em nikarin pembo hişk bikin. Fitne û fesad ketine bin xelkê û nahêlin ko bên karê xwe bikin. Ne ji xwedê ditirsin û ne jî ji mirovan şerm dikin« Hecî Xerab got..
»Ma pênc lîre çawa ne gelî çawîşan? Heyran hema bêyî ko ez ji van camêran bipirsim, min roja we jî pazdeh lîran zêde kir« Sebriyo got û li Remo, Xidir û Ehmê nerî.
Hersêyan li hevdu nerîn, bi serê xwe û çavên xwe ji hevdu re gotin baş e. Bi dû re Remo berê xwe da Sebriyo û »heyran baş e, lê ez texmîn nakim ko em bikaribin sibe derkevin ser erdan. Divê em herin, em sêhrê rast bikin û çawîşan razî bikin.«
»Du roj ji we re mohnet« Zahirê Hesen Çawîş got.
»Çima du roj Zahir, du rojên vê germê ji bo pembo bi gelekî ne« Hecî Ehmed got.
»Ez dizanim Hecî... lê baweriya te ji xwedê hebe, ne wek ko tu dibêjî hêsan e. Ez dizanim bê çi tifaq girêdanê. Ez îro sibehê derketim û min bi herdu çavên serê xwe dît. Xort û xwendevanên vî bajarî hemû derketibûn ser rêyan. Bi navê xwedê heger em ne bi hosteyî bikin, deh mêr dikarin li

kuçan bikevin. Ma heger ne eskerekî giran bê, kî dikare hemûyan ji rêyan derxe«.
»Xebera xalê Zahir e« Remo got.
Hecî Ehmed rabû ser kabokan û teqiya: »heger bi esker bibe, ez niha diçim ba serdarê leşkeran. Ez ê jê re bibêjim heger bi kuştina deh xwen-devanan jî be, divê tu rêyan vekî. Bi navê xwedê libek leşker li tabûrê nahêle, wê hemûyan ji bo min derxe ser rêyan û nav pemboyan. Ew li min«.
»Hecî ha Hecî, weleh îro agir ji devê te dibare«.
Sebriyo: »na Hecî Ehmed, na... bêhna xwe fireh bike« got û zîvirî ser Hecî Xerab û »tu jî hinekî bi zimanê xwe bikaribe Hecî Xerab, tu kêfa xwe ji kuştinê re tînî« got û îcar zîvirî ser çawîşan: »madem hûn bi bazarê re ne,
de herin sêhrê bigihînin xelkê. Lê eseh eseh, hûn nebin sedema tu tevlihe-
viyan. Bi bênhfirehî hevdu li ber bixin û bibêjin pênc lîre bes in û baş e«.
157
SORÊ GULÊ

»Bavo tiştê ko Sebriyo dibêje, tiştekî baş e. Bila sêhr wek gotina wî be. Hecî Ehmed ez dexîlê te me tu jî bêhna xwe hinekî fireh bike û we selam« Hemê Hûran got.
Hecî Ehmed serê xwe bi bêhntengî hejand. Bêdengî ket civatê. Hersê çawîşan li hev nerîn û bi çavan ji hev re »baş e« gotin. Bi dû re, »baş e... ya
xwedê... de rabin em herin û bazara xwe eşkere bikin heyran« Remo got.
»Bi xatirê we gelî camêran. Bazara me ser xêrê be. Li qusûra me mêze nekin« Ehmê Cemîlo got û da pêşiya herduyên din.

Ev yek zû hat bihîstin û li nav bajêr geriya.
***
Roja şemiyê, ne bi gelekî piştî ko roj çûbû ava, derket ko tiştê tê gotin rast e. Mirad û Mûsa hatin û gotin »Smaîl, heyran, Remo, Xidir û Ehmê dibêjin me bazar girêdaye, me pênc panot li roja karkeran zêde kirine. Divê em sibe herin ser karê xwe«. Lê Simaîlo û ên din, hewcedariya ko dûr û direj bişêwirin nedîtin û na gotin. Tu kesan pênc panot qebûl nekirin. Remo, Xidir û Ehmê Cemîlo tenê man xwediyê wê bazarê. Ên din hemûyan li hember wê yekê gotina xwe kirin yek û dan destê Smaîlo. Mirad û Mûsa şandin ser wan: »heyran herin bibêjin Remo, Xidir û Ehmê... bibêjin ezbenî em bazara ko we kiriye, qebûl nakin. Kîloya ba-canan bi pênc kaxetan e. Pênc kaxet ne pere ne«.
Piştî saetekê Mirad û Mûsa vegeriyan û gotin »heyran, dibêjin pênc kaxet bes in, lê ji bo ko nebe bêbextî, em sibejî narin kar. Lê welehî dusibe em ê herin, me soza xwe daye«.
Wê êvarê hinekî derengtirê şevê hat bihîstin ko zilamên xwediyên pem-boyan ketinê pêşiya Hadiyê Sofihincyas û Izzetê mala Çawîş. Lê li gor ko dihat gotin, herduyan wek du pilingan xwe parastibûn û carê yek dudu ji ser xwe avêtibûn. Seyfê Gavanan jî hema rasthatinî wê bîstikê di wir re derketibû û xwe dabû kêleka wan. Di nav çend deqîqan de dor deh xort û xwendevanên li wê derdorê çûbûn hewara wan. Serdar û Misto jî pir zû gihabûn hewara wan. Hadî hinekî êşiyabû, lê xortan jî ên din ji tiran xalî kiribûn. Piştî bi nîv saetekê, sûka bajêr tijê xort bû û li xwediyên erdan di-geriyan.
Rewş xeter bû, her demê dikarîbû pevçûn derketina. Hîna gava rewş wilo germ bû, Hadî ji nexweşxanê vegeriya. Mahmê qelenderî, »ha waye gurê piştşîn hat« got. Xortan li çepikan xistin û kêfa xwe bi hatina wî re

anîn. Serê Hadî bi du cîhan skestibû, lê wekî din, hîna wek îsotê tûj bû û bi cesaret bû. »Tiştek nebûye gelî hevalan, piçek xwîn ji serê min hat... piçek tenê bû, çû hat ji bîrakirin« got. Derengtirê şevê hat bihîstin ko dibêjin wê li Xalitê Kevanan bixin. Deh pazdeh xortan xwe karkirin û çûn hewara Xalit. Bi çend hevalên xwe re li kahwa şifêran rûniştîbû. Xortan ew birin heta mala wî û vegeriyan.

Roja din, hîna serê sibehê zû xuya bû ko êdî rewş ne baş e û xwendevan tenê mane. Hew Mahmê qelenderî û Seyfê Gavanan tenê di nav xwendevanan de mabûn. Dor bêriyan, dema xelk hêdî hêdî derketin sûkê, çawîş jî yeko yeko xuya bûn. Gihan kê, »heyran welehî karkerên me nema xwe digirin, dibêjin pênc kaxet bes in, em dixwazin herin karê xwe« gotin.

Roja duşemê, êvarê, bêyî serokê sendîqê û xwendevanan, çawîş li ser hevdu geriyan û çûn patronên xwe dîtin. Roja sêşemê wek ko tu tiştek nebûbû, wek ko tu karawestandin tune bû, karkerên xwe li traktoran suwar kirin û berê xwe dan nav erdan. Lê xwendevan di devê rêyan de bûn. Misto li ber traktora Biro rawestiyabû û destê xwe bi ser palên wî de

dihejand û »heqê we... we çi qasî erzan bixebitînin jî heqê we ye... gerek mirov ji bo perên ko berê didan we jî ji we bistîne derkeve rêyan bigire. Madem hûn bi a xwe tenê dikin, çi bidin we, besî we ye, gerek mirov wilo li we bike. Ma çi dikeve bêrîka me ko em serê vê sibehê derketine ser van rêyan û kezeba xwe reş dikin? Ma morîkên dêya me li vir neqetiyane. Ji bo we ye, lê hûn bi pênc kaxetan razî dibin, heqê we ko mirov we hemûyan bike sabûn« digot. Serdar hêdî hêdî di ber xwe de dikeniya û »bes e, em nema karin wan bigirin, wê herin« digot. Lê Misto guhdarî nedikir. Hinekî rawestiya û bi bêhntengî berê xwe da Biro û »Biro malx-

erabo, ka tu hevalê me bû, ka tu heta dawiyê bi me re bû, ka te dê li sûkê pêl zikê yên ko ji şêwrê derketina bikira« got. Biro bi lebat û awirên rebenan, bi gazindariyeke şermezar li Serdar nerî û dixwest bibêje »min ji Misto xelas bik, zêde bi ser min de tê.«
Komeke qîzan di traktorê de li Misto dinerîn û pê dikeniyan. Tavilê yekê »pênc kaxet bes in, de ka tu û hevalê xwe jî werin« got û wek ko di nav xwe û yeke din de cîh jê re veke, xwe da aliyekî. Dixwest bi ken û nazdariya mê, xortaniya wî bîne bîra wî û wî hinekî haş bike. Lê Mistoyê ko her demê ji qîzan hez dikir, êdî bi wê nazdariyê qet aş nebû. Çavên wî sor bûbûn û lêvên wî diricifîn.
Biro destê xwe bi aliyê qîzê de dirêj kir û »bes gû bux, zimandirêja pîs«

got û pê de xeyidî. Wê dev lêva xwe kir û stûyê xwe kişand nav milên xwe. Ên din bi ken bersiva wî dan. Yeke din »ma ji bedêla ko li van rastan kezeba xwe reş bike, hevalê xwe jî bîne û bi me re bên tevrikê ne baştir e« got û hemû bi hevdu re dîsa keniyan. Biro xeberek ji wê re jî da û xwest ko îcar nema deng ji traktorê derkeve. Misto reş û şîn bûbû. Di ber xwe de »mirov ne bêaqil be, mirov ji bo we destê xwe di ava sar û germ danake« got û li serê xwe xist, ji valabûna wî gazin kirin. »Ji bo xwe tiştekî nakin û nahêlin ko mirov jî ji wan re tiştekî bike« got. Lê qîzan li gor xwe her bela xwe tê didan û bi nazdariya xortanî bi wî û Serdar dikeniyan. Misto, wê sibehê ji wan û ji tinazên xortaniya wan fam nekir, xortaniya nêr di bedena wî de şiyar nebû. Serdar jê piştkul bû. Berî ko xeberên pîs ji devê wî derkevin, ew ji wir bi dûr xist û çûn cîhekî din.
Xwendevanan, wê sibehê kirin û nekirin karker ranewestandin. Dema wan û karkeran li ber hevdu didan, polîs û cendirme hatin û êrîş birin ser

wan. Piştî ko polîs û cendirme hatin û çek teqiyan, xwendevanan ji bê-gavî rê hemû berdan.
Wî çaxî, Misto û Serdar cîhê xwe berdan û xwe avêtin pişt dîwarê camiyê. Li wir, »Serdar, piştî mirov xwe gihand vir, mirov êdî xelasbûyî ye« got û rawestiya. »Heger bên, em ê xwe di ser vî dîwarî re biavêjin vê hewşê, bi dû re em dikevin yeke din û ji wê jî em dikevin ser kuçeke din. Bavê wan jî bê, nikarin me bigirin« got û ser gotina xwe temam kir.
Serê xwe di ber dîwer re derxist û nerî. Rahişt kevirekî wek nivweqiyekê û »êdî xwe ji revê re amade bik Serdar can« got û ji pişt dîwêr derket rastê.
Bi avêtina kevir re, barînî bi zilamekî ket û bû vingîna gulan. Ji kevirên dîwarê camiyê dipengizîn û diçûn. Cercûrek li ser hev li wir hat valakirin. Piştî ko xwe di ser herdu hewşan re qevastin û gihan ewlehiyê, îcar bi meşa sivik rêya xwe dom kirin. Misto »ew segbavê polîsê ko do demançe berdabû min bû... min tengala wî zeft kir. Gupîniya ko jê hat, ket guhê min. Ma ne heqê wî bû?« got.
»Belê. Te qenc kir. Lê ma tu nedît?«.
»Na tenişta wî ya rastê li min bû, lê li aliyê çepê dinerî«.
Dor esir bû, gava polîsan Memo ji bêdêla Misto ve girtin. Kevir kirin stûyê wî. Ji Serdar pê ve tu kesan nizanîbû ko Misto xwediyê kevir bû. Dû re hatin Mûsê Ziravan, Ûso, Sorê Têliyê û Xelê Pîro jî wek hevalên Memo girtin. Ûso li ba xwe hiştin û hersêyên din di nav du-sê saetan de berdan.
Êvarê hat gotin ko xwediyên pemboyan zirtan li Smaîlo dikin: »em ê li

sûkê lêxin û wî pîs bikin dibêjin« hat gotin.
Xortan zû ew xebera li hev gerandin û ji malên xwe derketin bajêr. Di

nîv saetê de dor sed xortî li ser hev civiyan. Elî, ji bo ko dengê wî here hemû xortan, hinekî hilda û »heta dilopa xwînê di me de hebe, em nahêlin ko destê hinan bigihije Simaîlo... heta derengê şevê jî em ji van deran bi dûr nakevin, lê em çar çar, pênc pênc bi hevdu re bigerin« got. Simaîlo li wir bû, hin Hêştirekî jî pê re hebûn. Merevên wî bûn.
Izzet li çarêyê derket ser tratuarê, dengê xwe hilda û »bi rebbê jor, heger destê hinan bigihije Simaîlo, em ê vî bajarî hilweşînin« got. Mahmê qelenderî dengê xwe hilda: »bi sê telaqên jinberdanê wê li ser Simaîlo, xwîn wek avê li vê sûkê biherikê«. Seyfo, »Mahmo a rast dibêje, wê xwîn biherike«.
Simaîlo serbilind bû û bi cesarettir bû. »Hûn sax bin gelî xortan, wê bi gunnê lawê min bigirin... wê kî bê gû bixwe... ez îşev ji vê sûkê naçim malê« got.
Simaîlo, Elî, Xalit û Hêştirekiyên din çûn li kahwa Şêrîno du sê mase dan ber hev û rûniştin. Wê bîstikê polîs hatin, raçav bûn, lê xortan ew zû dîtibûn, hinekî ji hevdu belav bûbûn û rewş ji wan re sexttir kiribûn. Rewş, nema wek tiştekî ji xeterê xuya dikir. Zû ji wir çûn. Sê peyên xwediyên pemboyan li kahwa ber otêla Hecî Naîf rûniştîbûn, deng çûbû wan bê Izzet û Mahmo çi gotin. Misto, ew ji zû ve dîtibûn û şanî Seyfo kiribûn. Piştî ko polîs çûn, »ha wane çendik ji wan, werin wan« got û bi lezê çû wan. Seyfo da dû. Di çend saniyan de hejmara yên ko êrîş birin kahwê, giha bîst kesan. Peyên axan rewş zûtir fam kiribûn, dema Misto êrîş bir wan, bi lez rabûn û di sûka spîndaran re serberjêr bûn. Sê zilam bûn. Misto û Seyfo û çend xortên din dan ser pişta wan, lê heta gihan sûka spîndaran, ew di reşê de wenda bûbûn.
Derengê şevê xort, yek-yek, dudu-dudu çûn malên xwe. Bi serketî bûn. Lê derengtirê şevê hinan çûn li deriyê sendîkê reşandin. Tu kes li wir tune bû, derî dabûn ber gulan, kiribûn serad. Derket ko Hecî Ehmed çûbû

keleş ji gundan anîbûn û ew kar bi wan dabû kirin. Lê çavên xortan ne-tirsiya. Roja din, dîsa zend û bend hilkirî li sûkê bûn. Sûk ji axan û peyên wan xalî bû. Li gor ko li nav bajêr dihat gotin, Hecî Ehmedê Gundikî, Hecî Xerabê Kurîsan û Sebriyê Medê heta êvarê ji tabûrê derneketin. Li gor ko dihat gotin, şêfê polîsan jî çûbû wir. Hisê Omerî berî esir ji bo karê xwe yê pasaportê çûbû wir û ew dîtibûn. »Welehî bin holika komandan kiribûn wek cîhê daweta bajariyan. Ser masan tije şûşe bûn, hin zer bûn

û hin sipî bûn. Deh cendirme li ber destên wan diçûn û dihatin. Sê çarkan jî li wê rastê beranek ji wan re kiribûn şîşeke mezin û di ser êgir re dizîvirandin« gotibû.

Êvarê, cendirme û polîs ketin nav bajêr. Simaîlo, Elî, Hadî û Izzet li kahwa Mecê girtin, Misto, Serdar, Mahmê qelenderî û Seyfo li taxa Qijlê li kahwê girtin, Xalit û çend hevalên pê re jî li kahwa şifêran girtin. Îsko ji restaurantê, ji ser şîvê rakirin û birin. Çeto li çarêya nava bajêr girtin. Gelek xortên din jî girtibûn. Hemû li ser hevdu bîst û şeş bûn. Sê rojan li ba polîsan man. Ew pir êşandin. Lê ji hemû kesan pirtir li Hadî, Izzet, Elî û Xalit xistin. Misto û Serdar, ne hindiktir lêxistin xwarin. Tiştê ko dihat famkirin ko wê polîsan ew dor heftakê deh rojan li ba xwe bihiştina û li wan bixistana. Lê dadgêrê bajêr dest danî ser bûyerê û xort ji polîsan xwestin. Dadgêrekî ciwan û demokrat bû, bihîstibû ko polîs lêxistineke bêûjdan li xortan dikin. Piştî ko xort derketin ba wî, wî jî rabû hemû berdan. Polîsan, tiştekî ko bikaribin wan pê bi girtin bidin, li ser kaxetê nepeyitandibûn, nikarîbûn. Memo tenê aliqandin. Polîsê ko kevir ji ten-gala xwe xwaribû, »min ew bi çavên xwe dît... ew bû ê ko kevir li min xist, ez wî nas dikim« got û ji ser a xwe daneket. Memo avêtin hepsê.

Rewşa bajêr ne pir ewle xuyabû. Xwediyên pemboyan, »em vê yekê ji xwendevanan re nahêlin, em dizanin bê kî û kî ne« digotin û zirt û fort dikirin. Ev deng dihatin guhên xwendevanan û wan bi xwe jî hesabê xwe li gor vê yekê dikirin. Rewş li ser tayekî xav bû. Herdu alî li ber hev bûn. Li ser bextê xwediyên erdan be, lê digotin ko xisareteke mezin li wan bûye. Ji ber wê yekê û xwestina hilanîna heyfê û tirsandina xortan û Simaîlo, tevgereke eceb di nav wan de çêbibû. Hecî Ehmed, di nav wê tevgerê de, bi kirinên xwe yên pirhêl, rola sereke girtibû ser xwe. Dema derdiket sûkê, gelekan ji wan xwe didan tenişta wî. Rewşa wî a li sûkê bûbû wek a axayekî gelekî mezin.
Lê maqûlên xêrxwaz ketin navê, çend rojan çûn û hatin û rewş hinekî nerm kirin. Herdu aliyan, soza ko wê êdî pevçûnan dernexin dan.
Lê a baş ko xwediyên erdan bûbûn du bend û du alî. Aliyek jê, Hecî Ehmedê Gundikî, Sebriyê Ûsivê Medê, Hecî Xerabê Kurîsan, Mala Nigmezinan û Hemê Hûran, ên ko hevalê xerabûnê û darê zorê bûn û aliyê din jî mala Zoro, mala Hindî û hin ji Baqisyaniyan bûn. Ew hevalên xêrê û li hevdukirinê bûn. Lê ên din xurttir bûn.
***
Mala Şemê xwe ji çûna Nisêbînê re kar kiribûn. Tişten ko diviyabû Ebû

Ferîd bike, hemû di deh rojan de kiribûn. Sê paswan ji bo pênc rojan derxistibûn. Hecî Elî ji serdanê haydar kiribû. Ebû Ferîd hemû tişt wek saetê li hev suwar kiribûn û meşandibûn. Heta wî çaxî hemû tişt wek tizbiyê bi dû hev de hatibûn û ava bûbûn.
Hiso, Xanimê û Ebû Ferîd çûn û wek xwazgînî li ser cila Hecî Elî rûniştin. Seîd li ber dikanê hiştin. Heta ko ew ji serxetê vegeriyan, ew li ser êgir bû. Xwestin û hezkirina wî gihabûn doşa destpêka evîndariyeke

mezin û bêhedan.
Wan û Hecî Elî bi hêsanî li hevdu kirin, lê Gulê, bi biryardarî »ez tu Seîdan nakim« got û herimî. Hîna êvara pêşî çû devê xwe bir ber ê Xanimê û bi hêrs »ez lawê te nakim, ez dixwazim dibistanê bixwînim« got. Lê tu kirinên wê, ew xelas nekirin. Stiyê bi xwe jî hevaltî û alîkariya wê nekir. Hecî Elî dan rast dîtibû, rast bû. Mala Şemê dost bûn. Bawer dikir ko wê li ba Sarê xenê bûba. Û hatibû bîra wê ko dilê Gulê di yekî Omerî hebû. Sêvê carekê gotibû. Lê heger xort li dinyê nemana jî, wê Hecî xwe nedaba ber ko wê bide wî. Ma kê qîz dabûn Omeriyan ko îcar wî bida! Heger qîza wê bi dû biketa û ko revandin jî bihata serê wê, xwe ji nav lepên Hecî xelas nedikir. Ji ber wê yekê destê wê di dilê wê de bû. Gava dît ko Gulê nayê rayê, çû giliyê wê li ber Hecî kir. Hecî Elî hat, tiliya xwe bi ser de hejand, divê ev yek bibe got û çû. Lê Gulê dîsa nehat rayê. Gava cara din hat, îcar ew da ber pêhn û nihtikan.
Sêvê li hemberî dana wê derket. Stiyê guh neda mêvantiya wê û çû giliyê wê jî li ber Hecî kir. Hat wê jî. Wê jî têra xwe lêdan xwar. Hecî çi kir, Gulê razî nebû û Sêvê xwe ji pişt wê neda alî. Wî şerî û wê lêdanê, heta derengê şevê ajot. Her yekê ji wan, sê çar caran lêdan xwarin. Derengê şevê gava Xalit hat, li hewşê dengê giriyê Sêvê û Gulê kir. Berî ko here ba zilaman, çû aliyê malê û rewş dît. Piştî wî bi bîstikekê, Hecî dîsa hat ser wan. Lê gava Xalit ew li pêşberî xwe dît, xwe negirt, rastkirina bêr di stûyê xwe de dît û »ma ev çi ye apê Hecî, tu dîn bûyî, tu dikî Gulê bi zorê bidî« got, piştgiriya Sêvê kir û Gulê parast. Bi wan gotinan re, herdu çavên Hecî Elî di nava serê wî de bûn wek du fincanên xwînê. Bêyî ko tu tiştekî bibêje, bi dest û lepan çû ser Xalit. Ew heta hêwanê da ber dahfan. Li wir, ji nû ve îcar jê re, »te pemboyê xelkê hemû hişk kir hey kafir... te mala xelkê xera kir... îcar dora me ye ne wilo! Îcar tu hatiye fitneyê jî di nav me de dikî! Çi bi serê te ketiye, kafir! Xelkê digot zavê te ko-

munîst e, lê min bawer nedikir. Min ji bo xatirê bavê te tu kir zavê xwe. Lê çû! Ma tu ê ko mirov jinan bidyê bû, kûçik. Lê çi feyde... wê êvarê ko-
163
SORÊ GULÊ

munîstên hevalên te zû hatin û tu xelas kirin. Welehî wê camêran tu bikuştana, wê em jî ji te xelas bikirana, lê ew kafir zû bi teve hatin« got, çû Sêvê ji odê anî û wek rêsiyekî avêt nav şekalan ber nigên wî û »bila careke din nigên te û vê tireka jina te bi vê malê nekevin« got û ew ji malê derxistin.
Xalit şaş bûbû. Ji çûnê pê ve, tu rêyeke din li ber xuya nedikir. Welehî »xezûrê min dîn bûye« ji xwe bi xwe re got û feyde di axavtina pê re nedît. Ûsiv dît bê çi bû. Bi wê kirina bavê xwe kêfxweş bû. Bavê wî çi bikira ji Xalit, hindik bû. Û êdî Sêvê jî jina wî bû; ew jî hêdî hêdî dibû wek wî. Gumana ko wî bi xwe dikir, wê Sêvê limêj û rojî herdu biterikandina û bûba kafireke wek wî. Êdî gava ew wek kevokeke baskşkestî di nav destên bavê xwe de dît jî, dilê wî pê neşewitî. »Çi bê serê wê, heqê wê ye... ma mêr li dinyê tunebûn« ji xwe re got.
Xalit û Sêvê dilşkestî ketin rêya malê. Herdu gelekî li ber rewşê ketibûn. Xalit, »Sêvê welehî bavê te dîn bûye. Ji xwe sermezinê birê te... tu dibê qey di şkeftan de mezin bûye û mirov nedîtine. Çawa dikarin wilo bikin... çaxê dana jinan a bi zorê çûye bavo... welehî bavê te dîn bûye! Ma tu êşand Sêvê?« got û çepilê xwe li newqa wê pêça.
Sêvê bi îsk îskê û girî »erê welehî... nav pişta min û parsûyên min hemû diêşin. Ji xwe Gulê... mala min şewitî... bi xwedê ew hûr kir... ew ê nema bikaribe rabe ser xwe... xebera te ye, dîn bûye... bi xwedê nema nigên min
bi mala wî dikevin... ne bavê min e... hemû ne tiştekî min in« got û serê

xwe danî ser milê wî. Heta malê bi wî halî çûn.
Xalit çû malê û ramiya. Nameyek ji Seîd re nîvîsî. Xwest rewşê jê re rave bike û Gulê xelas bike. Roja dawî, berî ko xwazgînî vegerin, bi xuşka xwe ya biçûk re gihand mala xezûrê xwe. Leyla biçûk, »xaltika Stiyê, kekê min Xalit got silavan lê bik, bila vê namê bide Ebû Ferîd. Bila bide Seîd« got. Stiyê, »baş e keça min, ka bide min« got û name ji destên wê girt. Lê berî ko bide Ebû Ferîd, Hecî Elî û Ûsiv jê haydar kirin. Texmîn kirin bê çi nivîsiye. »Ma komunîstekî kafir dikare çi binivîse, her nikare ji xêrê re be« ji hev re gotin. Gava Ûsiv name vekir û xwend, »yabo bi wê heca ko te tewaf kiriye, ji serî heta binî komunîstî û fitneyî ye... û ji xwe bi Kurdî ye... ya ya gidî komunîstê dijmin... mirov ji bedêla nameyeke wilo ve, kîlok esrar bi hevdu re bişîne çêtir e... ji Seîd daxwaz dike ko ji vî karî vekişe... û nivîsiye ko Gulê jê hez nake, ne bi dilê wê ye« got.
Hecî Elî dîn û har bû. Lê Xalit ne li ber destên wî bû. Tavilê devê wî vebû: »ma çi bi serê wî sa kurê sayî ketiye. Ma çi eyba me diye. Ma ne çû...

çû min qîza xwe dayê û ew di xwe gerand û kir stûyê xwe. Lê ew jî çûye û bûye. Li min guhdar bike Stiyê... bi heca ko ez çûmê yê, heger nigên wî û tireka jina wî bi vê malê bikevin, ez te sax nahêlim. Ne zavakî min ê wilo û ne jî dêlikeke qîza min a wilo heye... ma ne çû min dayê... ez dereng pê hisiyam« got û destê xwe avêt namê. Kir hezar parî û avêt nav şekalan. Bi dû re, »here keça min Selma, here wan kaxetan biavêje tifikê« got.
Pênc roj ji bo Seîd wek pênc salan bûn, lê ew pênc sal jî çûn. Dema xwazgînî çûn û jê re gotin ko Gulê jê re xwestine, firiya ber perên ezmên, dinyayê bi rengekî din xuya dikir, babetekî hewa din diçû nava wî. Êdî jînê, xweşiyeke mezin dida bedena wî. Dilê wî yê nû çarkopal lê dixist, geş bû, di bedena zinde û bi azweriya mêraniyê meyayî de, kêfeke belek

dikir.

Dawiya pirtûka yekem.

165

SORÊ GULÊ

WÊRAN

Laleş Qaso

ŞAHZADEYÊ QIÇIK

Antoine de Saint Exupêry

Wergêr

Mêhdî Ceferzadeh

Şahzadeyê Qiçik 2

سرشناسه : سنت اگزوپری، آنتوان دو، ۱۹۰۰ - ۱۹۴۴ م.

عنوان و نام پدیدآور : Şahzadeye Qicik/ Antoine de Saint-Exupery, Antoine de Saint Exupêry;; Wergêr Mêhdî Ceferzadeh. مشخصات نشر : قم: : عمو علوی، ، ۱۳۹۴ = ، ۲۰۱۵ م.

مشخصات ظاهری : ۹۲ ص.؛ ۵ / ۱۴ × ۵ / ۲۱ سم.

شابک : ۶۰۰۰۰ ریال 978-600-7069-35-6 : وضعیت فهرست نویسی

فیپا :

یادداشت : کردی آوانویسی شده به انگلیسی.

موضوع : داستانهای فرانسه - - قرن -- ۲۰ م.

شناسه افزوده : جعفرزاده، مهدی

شناسه افزوده : Jafarzadeh, Mehdi رده بندی کنگره : PQ۲۶۲۳ / ردهن۳ش۲۱۴۱۳۹۴ بندی دیویی : ۹۱۲/۸۴۳ شماره کتابشناسی

ملی

ویراستار : عباس فرهادی

: ۳۹۸۲۰۰۰

Şahzadeyê Qiçik 3

Pêşgotin

Dema ku min pirtûka Şahzadeyê Qiçik xwend û gihîştime dawiya wê, fikr û ramana wergerandina wê jî kete serê min. du wergerên pirtûkê li ber destê min hebûn ku her du jî bi farisî bûn. ez fransizî nizanim. Tevî ku pisporên warê wergerê dibêjin:"wergera wergerê karekî şaş e" lê dîsa jî min xwest ku vê pirtûk a giranbiha li zimanê kurdiya kurmancî wergerînim. Wergerên farisî yên ku li ber destê min bûn her du jî ji du nivîskarên binavûdeng ên Îranê bûn. wergera yekem a rehmetî Muhemed Qazî û ya din jî wergera rehmetî Ehmedê Şamlû bû. wergera Qazî zêdetir ji min ra bû jêder lê dema ku rastî hin pirsgirêkan dihatim min her du werger didan ber hev û wateya giştî jê derdixist. Min di wergerê da xwestiye ku hin têgeh û gotinên kurdên Xorasanê jî têxim nav nivîsê. Dibe ku hin têgeh ji xwendevanan ra ron û eşkere neyên ber çavan. Lêbelê em dikarin bi vî rengî hin peyvên kurdî ku tenê li Xorasanê hene, li wêjeya kurdî zêde bikin.

Mêhdî Jafarzadeh

Besre/Iraq - Gulana 2015

Jafarzade.me@gmail.com

Şahzadeyê Qiçik 4

Pêşkêş sewa Leon Vêrt

Ez ji zarokan lêborînê dixwazim ku min ev pirtûka pêşkêşî mirovekî salmezin kiriye. Sedema vî karî Ji ber vê yekê ye ku ew rindtirîn hevalê min li dinyayê ye. Sedemeke din jî ew e ku ew dikare her tiştî hetaji pirtûkên zarokane jî fam bike. Sedema sêyemîn: hevalê min niha li Fransayê ye û li wir serma û birçîbûnê jî dihemilîne û divê ku ez pir dilê wî hilînim. Eger ew sedemana ne bes bin, ez dixwazim vê pirtûkê pêşkêşî dema zaroktiya wî bikim. Di serî da hemû mirovên salmezin, zarok bûne. Loma jî ez serenavê vê xelatê wisa sererast dikim:

Pêşkêş sewa dema zaroktiya Leon Vêrt

Şahzadeyê Qiçik 5

1

Dema ku ez şeş salî bûm min pirtûkek bi navê çîrokên rastîn dît.

Ew pirtûka derbareyê daristanekî bikr û destlêneketî hatibû nivîsandin. Di pirtûkê da nigareke pir balkêş ji mareke bûa ku heywaneke hov dadiqultand, hatibû kişandin. Ew wêneya tiştekî wisan bû:

Di pirtûkê da bal hatibû kişandin ser vê yekê ku:"marên bûa nêçîrên xwe bêyî ku bicûn, bitûn dadiqultînin, êdî şeş mehan heta ku laşê nêçîrê di nav hûrê wan da bihelê ji cihê xwe nalivin û radikevin."

Dema ku min ev çîroka xwend, ez derbareyê bûyerên ku li daristanê diqewimin ketime nav fikir û ramanan û min yekemîn nigara xwe li ser kaxezê kişand ku ew jî wisa bû:

Şahzadeyê Qiçik 6

Min şahkara xwe nîşanî mezinan da û min ji wan pirsî: "gelo hûn ji dîtina vê wêneyê ditirsin?"

Li min vegerandin: - çima divê em ji dîtina kumekî bitirsin?

Wêneya min kişandibû ku kum nebû, mareke bûa bû ku fîlek bitûn daqultandibû û dixwest wî hezim bike. Wê demê ji bo têgihîştina mirovên mezin min fîlek jî di zikê bûayê da kişand. Pêwîst e ku her tiştî ji wan ra şirove bikî. Wêneya min a dudiyan wisan bû:

Mezinan ji min ra gotin, dest ji kişandina nigara marên bûa berde û ji şûna vî karî, zêdetir bala xwe bide ser waneyên xwe yên wekî erdnigarî, bîrkarî û rêzimanê.Wisan bû ku min di şeş saliya xwe da dev ji karê zerîf ê nigargeriyê berda. Ji vê yekê ku nigarên min bala wan nekişandibû, ez hinekî ji karê xwe dilsar bûm. Girên me eger bi halê xwe bên berdan tu wextî tiştan ji hev der naxin. Zarok jî aciz dibin ku tim her tiştî ji wan ra şirove bikin.

Neçar mam ku karekî din ji xwe ra peyda bikim û loma jî çûm û hînî pîlotiyê bûm. Heta niha kêmzêde li hemû dinyayê firiyame û bi rastî jî erdnigariyê pir alîkariya min kiriye. Bi awirekî dikarim Çîn û Arîzonayê ji

ser hev nas bikim. Eger mirov di dilê şevê da sergerdan û rêwendakirî bimîne wê demê zanista erdnigariyê dikare gelek alîkariyca wî bike.

Şahzadeyê Qiçik 7

Ez di jiyana xwe da bi komên mirovên girîng ra, geriyame. Li ba gelek mirovên mezin û xwedan prensîp jî jiyame. Û tevî ku min ewna ji nêzik da dîtine jî, lêbelê nebûye sebeb ku ez bawera xwe bi wan bînim.

Her çaxê ku min mirovekî rewşenbîr û xwedan raman di nav wan da ditît, min ew bi yekemîn nigara xwe ku hîn jî bi min ra heye, diceriband, ku bibînim gelo tiştek di tûrikê bîr û ramanê wî da heye yan na. lê wî jî wek her kesî wisa bersiva min dida ku:"ev kumek e." wê demê êdî min jî qala marên bûa, daristanên bikr û destlêneketî û stêrkan, ji wî ra nedikir. Min jî bi qasî asta têgihîştina wî xwe qiçik dikir û me derbareyê gulf û siyaset û cûreyên gerstêrkan xeber dida. Wî jî ji ber ku mirovekî biaqil û têgihîştî nas kiriye, pir kêfxweş dibû.

2

Wisa bû ku jiyana min di tenêtiyê da derbas dibû, bêyî ku kesek hebe ez bikaribim pê ra du peyvan gep bikim. Heta şeş salan berî niha li çoleke hişk û bêav(sehra) tûşî bûyerekê hatim, alavek ji mekîneya balafira min şikestibû û ji ber ku kesek tunebû ji bo temîrkirinê alîkariya min bike, min bi tena serê xwe dest pê kir ku gaşe wê temîr bikim. Mesela hebûn û nebûnê bû. Avê ku bi min ra hebû herî zêde heta heşt rojan besî min dikir.

Bi hezaran maylan dûr ji her gund û şûn û waran, min şeva xwe li ser qûmê gihande sibê. tenêtir ji soberîbarekê di navbera panavê da, min xwe li perwazekî nûsikandibû. Êdî hûn dikarin têbigihêjin serê sibê dema ku min dengekî zerîf û ecêb bihîst çiqas matmayî mam. "ji kerema xwe ji min ra nigara berxekê bikişîn!" ez ji xewê veceniqîm.

- ha?

Şahzadeyê Qiçik 8

- ji min ra nigara berxekê bikişîn…

Wisan ku birûskê li min dabe, min ji şûna xwe bazda. Min baş ku çavên xwe ve kirin û min mêze kir; mirovekî qiçik û ecêb li hemberî min sekiniye û li min xire bûye. Ev xweşiktirîn nigare ji wî ye ku min kişandiye, helbet ev li ku û ew li ku! Sûca min çi ye? Mezinan ez di şeş saliya min da ji nigargeriyê dilsar kiribûm û ez ji bilî bûayên"ve" û "girtî" hînî kişandina tu tiştî nebûbûm.

Ji nişkê va ku min ew dît çavê min bel û vekirî man. Ji bîr nekin ku ez ji gund û waran bi hezaran maylan dûr ketibûm, wisa xuya nedikir ku vî mirovî riya xwe wenda kiribe yan jî ew ji westiyan, tîbûn û tirsiyanê, di rewşa mirinê da be. Tu tiştê wî zarokî, ne mîna kesekî bû ku bi hezaran maylan ji gund û waran dûrketî û wendabûyî be.

Şahzadeyê Qiçik 9

Dema ku êdî di encamê da deng ji min derket:

- tu li vir çi dikî?

Wî jî pir aram û cidî dubare kir: - ji kerema xwe ji min ra nigara berexekê bikişîn.

Dema ku mirov dikeve bin bandora razekê, êdî nawêre destûrê bi cih neyîne. Tevî ku li wê çola dûrketî ji waran û nêzikbûna metirsiya mirinê ev kara bêwate dihate xuyakirin jî, lê min pênûs û kaxezek ji bêrîka xwe derxist. Lê nû hate bîra min, ez

Şahzadeyê Qiçik 10

tenê hînî tiştên wek dîrok, erdnigarî, bîrkarî û rêzimanê bûme. Û min bi rûyekî tirş û tal bi wî zarokê qiçik ra got ku ez nigargeriyê nizanim. Wî li min vegerand: - tişt nake, ji min ra berexekê bikişîn.

Ji ber ku min qet di temenê xwe da nigara berxan nekişandibû, yek ji wan du nigarên ku her dem min dikişandin, jê ra kişand.

Bûayê girtî. Lê dema ku min gotina mirovê qiçik bihîst, bi dest xwe da mam.

- na! na! ez fîl di zikê marê bûa da naxwazim. Bûa pir xeternak e, fîl jî şûna me teng dike. Mala min pir qiçik e, ez berxekê dixwazim. Sewa min berxekê bikişîn.

- baş e, min kişand.

Bi baldarî lê temaşe kir û got:

- na! ev ku nexweş xuya dike. Yeke din bikişîn.

- min kişand.

Şahzadeyê Qiçik 11

Bişirînek li ser lêvên wî şîn bû û bi nefsqiçikiyê got:

- Tu bi xwe dizanî ku ev ne berx e. beran e. şaxên wî hene…

Dîsa min nigare guhert.

Wî ev jî mîna yê berê nepejirand:

- Ev ku pir pîr e… ez berxekê dixwazim ku heta demeke dirêj bijî…

Ji ber ku ez bi lez bûm û min dixwest mekîneya balafirê temîr bikim, min bi bêhntengî nigara sindoqekê kişand û sê kun jî li ser danîn, û min bêyî hemdê xwe tiştek got:

- ev sindoq e. berxê te jî di hundirê wê da ye.

Wê demê min dît ku wî rûyê xwe ji min ra ve kir û rewşa wî guhert, ez pir mat mam:

- Aha… heman tişt e ku min dixwest! Bi nêrîna te ew berxa êm pir dixwe?

- çere?

- ji ber ku şûna min pir teng e…

- erê, her çi bibe jê ra bes dike. Berxê ku min daye te pir qiçik e.

- na! ewqas jî qiçik nine…! Raketiye …

Şahzadeyê Qiçik 12

Û wisa bû ku min Şahzadeyê Qiçik nas kir.

3

Demeke dirêj derbas bû heta ku min fam kir ew ji ku hatiye. Şahzadeyê Qiçik ku her dem pirsên xwe ji min dikirin û tu carî jî li min guhdarî nedikir. Tenê hinek agahî ji gotinên wî ji min ra aşkar bûn. Mînak, yeke car ku balafira min dît ji min pirsî:

- ev tişta çi ye?

- ev "tişta": difire. Balafir e. balafira min e.

Ji vê yekê ku min ew têdigihand ez li asmanan difirim, pir kêfxweş bûm. Matmayî got:

- Çi? Tu ji asmîn da ketî?

Min bi nefsqiçikî got: -erê.

- Ji min ra êdî pir ecêb e!

Û wisa bi dengekî bilind kenî ku ez bi dest xwe da mam. Rastiyê bêjim, dilê min dixwaze her kes pirsgirêkên min cidî bigire.

Kenîna wî ku bi dawî hat, got: -pes tu jî ji asmîn têyî! Tu ji kîjan gerstêrkê yî?...

Mîna ku yêkecarî ji xewê rabim, tiştek hate mêjiya min. min ji nişkê va pirsî:

- Pes tu ji kîjan gerstêrkê hatî?

Bêyî ku awirê xwe ji balafirê berde, aram serê xwe zivirand. Lê bersiva min neda, tenê li ser balafirê hûr û kûr bûbû û hêdî hêdî serê xwe dihejand.

Şahzadeyê Qiçik 13

Got: - ji her derê jî ku hatîyî, ez bawer im ku şûneke ne pir dûr be…

Demeke dirêj kete nav xewn û xeyalan û ji dû ra nigara berxê, ji bêrîka xwe derxist û bi baldarî li wê gencê xwe yê binirx nêrî.

Ji vê peyvê "gerstêrkeke din", ewqas kelecanan ez girtibûm ku nayê gotin. Min hinekî zêdetir pê ra gep kir ku zêdetir derbareyê wî bizanim:

- Tu ji ku têyî hevalê min ê qiçik? Mala we li kû ye? Tu dixwazî bi nigara berxa ku min ji te ra kişandiye çi bikî?

Demekê bêdeng ma û li min vegerand:

- Qenciya sindoqê te daye min ew e ku berxa min dikare şevên xwe di wê sindoqê da derbas bike.

Şahzadeyê Qiçik 14

- Diyar e… lê eger tu kurekî baş bibî, ez ê werîsekî jî bidime te ku pê berxa xwe girê bidî. Werîsek û singekê…

Ji pêşniyaza min matmayî ma:

- Girê bidim? Çiqas ecêb!

- Eger girê nedî ew ê bireve û here wenda be.

Hevalê min dîsa qeh qeh kenî:

- Ew dikare here ku derê?

- Xwedê dizane. Li her derê ku çêregeh hebin ew ê biçe.

- Ba here… ohhh, mala min pir qiçik e!

Û bi dilgiranî got:

- Rasterast jî ku bixwaze biçe lê nikare biçe cihekî dûr…

4

Bi vî awayî min mijarekî din ê pir girîng jî fam kir: ku gerstêrka wî ji maleke asayî hinekî mezintir e. Ez ji têgihîştina vê xalê pir mat nemam. Min dizanîbû ji bilî gerstêrkên mîna Erd, Keywan, Tîr û Nahîdê ku gelekî jî binavûdeng in hin gerstêrk hene ku bi dûrbînên stêrknasan jî bi dijwarî tên dîtin. Her çaxê stêrknas wan kişf dikin ji şûna navlêkirinê, ew wê bi hejmarekî bi nav dikin. "Gerstêrka 3251'an".

Hinek nîşane û delîl hebûn ku isbat dikirin Şahzadeyê Qiçik ji gerstêrka B612 hatiye

Şahzadeyê Qiçik 15

Ev gerstêrka di sala 1909'an da ji aliyê stêrknasekî tirk va hatibû kişfkirin. Wî di kungereya navnetewî ya stêrknasiyê da kişfê xwe ragihandibû lê ji

ber ku cil û bergine ecêb li xwe kiribûn tu kesî ji wî bawer nekir. Mirovên mezin wisa ne!

Şahzadeyê Qiçik 16

Ji şansa gerstêrka B612'an, Tirkekî desthilatdar bi darê zorê netewa xwe mecbûr kir ku cil û bergên Ewropayiyan li xwe kin. Stêrknasê tirk carekî din di sala 1920'an da, lê vî carî bi rewşeka nû û jêhatî ji bo kişfa xwe belge û delîl anîn û her kesî jî aliyê wî girt.

Ji ber ku mirovên salmezin ji hejmar û reqeman pir hez dikin, loma Ez hûrgiliyan jî derbareyê gerstêrka B612'an ji we ra dibêjim. Dema tu li ba mirovên salmezin qala hevalekî nû bikî, ew tu caran derbareyê wî pirsên bingehîn û sereke nakin, tu caran napirsin "ahengê dengê wî çawa ye? Ji çi cûre lîstikan hez dike? Minminîkan berev dike yan na" dipirsin: "ew çend salî ye? Çend xweng û bira ne? giraniya

Şahzadeyê Qiçik 17

wî çiqas e? bavê wî mehane çiqas dirav distîne?" piştî van pirsana êdî di xeyalên xwe da fikir dikin ku wî baş nas dikin.

Eger ji mirovekî salmezin ra bibêjî ku min avahiyeke pir bedew dîtiye ku xiştên (kelpêç) wê sor in, ber pencerê wê tijî gulên şemdanî û li ser banê jî gelek kevok hebûn, ew qet nikare di mêjiya xwe da mucesem bike. Lê divê ku bi wan ra bibêjî min avahiyek dît qêmeta wê milyonek dolar e, wê çaxê dengê xwe bilin dikin û dibêjin: - weyyy çiqas bedew û ciwan e!

Yan eger bi wan ra bibêjî "sebeba ku ez ji Şahzadeyê Qiçik hez dikim ew e ku wî ji min tenê berxek dixwest û zarekî pir şêrîn û rûken bû, ew jî delîleke baş e ez ji kesekî hez kim" henekên xwe bi te dikin û bi te ra weke zarokan reftar dikin! Lê dema tu bibêjî "ew ji gerstêrka 612'an hatiye" di heman anê dê bawer dikin û êdî hezaran pirsên ecêb ji te napirsin. Gerek ji wan narahet nebî. Divê zarok li ber mirovên salmezin hinekî nefsqiçik bin û bi wan ra mudara bikin!

Lêbelê kesên ku wateya rastîn a jiyanê dizanin û têdigihêjin, bi hemû hejmar û reqeman dikenin. Tiştê dilê min dixwest ew bû ku ez çîroka xwe weke çîroka periyan dest pê bikim: "hebû tunebû, rojekê Şahzadeyekî

qiçik hebû li gerstêrkekê dijiya, ev gerstêrka hinekî ji wî mezintir bû û Şahzade li heval û hemzimanekî digeriya", ew kesên ku wateya rastîn a jiyanê dizanin, vî awayî baştir û bêhtir dipejirînin. Ez naxwazim tu kes pirtûka min bê baldarî û serserî bixwîne. Tenê xwedê dizane ku ez bi bîranîna vê serpêhatiyê çiqas xemgîn dibim. Niha şeş sal in hevalê min bi berxa xwe va ji cem min cûye. Ji ber ku ew ji bîra min neçe ez qala wî dikim. Jibîrkirina hevalekî rind gelek xembar e. her kes ku

Şahzadeyê Qiçik 18

nabe dost! Ez jî weke mirovên salmezin nînim ku tenê çavên min li hejmar û reqeman bin. Ji ber vê yekê jî dîsa ez çûm û min hinek pênûsên rengîn kirîn. Û min di jiyana xwe da ku ji bilî nigara marên bûa yên ve û girtî tu tişt nekişandibû û ew jî di şeş saliya min da bû, lê niha dîsa destpêkirina min bi nigargeriyê karekî kesanedî û nadir bû. lê heta ku ji destê min were ez hewl didim tiştekî ku lê bişibe bikişînim lê eger jî nekaribim bi ser kevim, di dawiyê da yek ji wan lê diçû û yek lê nediçû. Li ser bejn û bala wî jî hinekî gengeşe hebû. Bejn û bala wî di nigarekê da pir bilind û di yeke din da pir nizm derhatibû. Rengê cil û bergên wî jî nedihate bîra min. bi texmîn û gumanan ez bi pêşda diçûm. Dîsa jî min bi xwe ra digot, ji nebûnê baştir e. Divê min biborîne. Hevalê min tu tişt şirove nedikr. Renge wî ez jî mîna xwe dihesibandim. Lê bedbextane min berxek di nav sindoqê da nedidît. Belkî ez jî weke mirovên salmezin im. yan jî ez pîr bûme.

5

Her rojek ku bi ser min ra derbas dibû min ji gerstêrkê û ji koçberiya wî tiştine nû derdixistin.

Ku bi giştî jî dûhatên fikirînên min bûn. Û wisa bû roja sisiyan ez ji çîroka xembar a darên Baûbabê agahdar bûm. Vê carê jî bi siya serê berxê bû ku min fam kir, Şahzadeyê Qiçik ku şaş mabû, bi carê ra ji min pirsî:

- Gelo pez şitilê daran dixwin?

- Belê, rast e.

- Oh! Ez pir kêfxweş bûm.

Min fam nekir çima mijara hatinxwarina şitilên daran, ewqas ji Şahzade ra girîng bû lê wî domand:

Şahzadeyê Qiçik 19

- Pes êdî ew darên Baûbabê jî dixwin?

Min bi wî ra got ku darên Baûbab ne şitil in û her yek ji wan bi qasî kilîsayekê mezin e. Û eger keriyek fîl jî hildî ser hev ew nagihên nikilê darê.

Sêwirandina keriyeke fîlên hildayîserhev ken li ser lêvên Şahzadeyê Qiçik şîn kir:

- Yanê tu dibêjî gerek em fîlan li ser hev dayînin…

Lê şîreteke aqilmendane jî kir:

- Lê darên Baûbabê jî berî ku mezin bibin, şitil in.

- Rast e! Tu çima dixwazî pezên te şitilên Baûbabê bixwin?

Got: - Ev ku xuya ye!

Xuya bû ku min pirseke eyan û eşkere jê pirsiye, û ji bo têbigihêjim ka mebesta wî çi ye hûr û kûr fikirîm. Rastî ew bû ku li ser gerstêrka Şahzadeyê Qiçik jî mîna her cihekî din tovê giyayên baş û nebaş hebûn. Û di encamê da ji tovê rind

Şahzadeyê Qiçik 20

giyayê rind û ji tovê xerab jî giyayê xerab hasil dibûn. Lê tovên giyayan nayên naskirin.

Di tenêtiya xweliyê da radikevin û her çaxê dilê wan bixwaze zîl didin û bi ten û laşê xwe yê zirav û tenik, ji nav xweliyê va xwe rû li tavê dikişînin. Eger ev tiştê zîl daye û şîn bûye, guleke bedew û rindik be, dihêlin ew can bigire û mezin bibe lê dema bê naskirin ku ew tiştekî nebaş û bi kêrnehatî ye, divê ew ji kokê va bê qirkirin.

Belê di gerstêrka Şahzadeyê Qiçik da hin tovên metirsîdar hene… û yek ji wan jî tovê dara Baûbabê bû. Gerstêrka erdê ji wan tijî ye. Baûbab dareke ku eger zû ji wê ra çareyek neyê dîtin, êdî direng dibe û nema dikarin ji

şerê wê bifilitin. Û kok û cileyê wê seranserî gerstêrkê digirin û her derê kunkunîşk dikin. Û eger gerstêrk qiçik be û darên Baûbabê jî zêde bin, wê demê gerstêrkê diteqînin.

Şahzadeyê Qiçik piştî demekê ji min ra digot: "Ev jî erk û wezîfeyek e. dema mirov xemilandina xwe qedand, divê bi

Şahzadeyê Qiçik 21

baldarî gerstêrka xwe jî paqij bike û wê jî bixemilîne. Mirov divê tûmên gulan û şitilên daran ku di qiçiktiya xwe da pir jî dişibin hev, qe ji ser hev hatin naskirin di heman demê da, şitilên Baûbaban qir û cilebir bike. Ev karekî hêsan e lê mirovan diwestînê."

Rojekê wî pend û şîretên xwe li min kirin û ji min xwest ez nigara dareke Baûbabê bikişînim û wê darê bi zarokên welatê xwe ra bidim nasandin, ji dû ra got: "eger rojekê ew bixwazin biçin geriyan û koçertiyê, ew nigara bi kêrî wan tê. Hin caran eger mirov hin karên xwe ji pêşerojê ra bihêle ne pirsgirêk e, lê eger ew tişta qirkirin û paqijkirina Baûbaban be wê demê dibe karesat. Ez gerstêrkekê nas dikim ku tenbelî û naratiyê li wir kon vegirtibû û wan kokbirkirina sê darên Baûbabê ji bîr kiribûn…"

Min li gorî şiroveyên Şahzadeyê Qiçik nigara wê derê kişand.

Ez naxwazim bibime mamosteyê exlaqê lê di wê gerstêrkê da ewqas xeter û metirsî hene ku metirsiya nenaskirî ya darên

Şahzadeyê Qiçik 22

Baûbabê li bercî wan qet nayê hesibandin û loma jî vê carê ez dixwazim bibêjim: "zarokino, haya we ji darên Baûbabê jî hebe!"

Xuya ye eger min li ser vê nigarê pir zehmet kişandiye ji ber vê yekê ye ku hevalên min weke min demeke dirêj e bala xwe nedane ser wê darê, niha ji hebûna metirsiya vê darê haydar bin. Peyama ku di vê nigarê da hatiye dayîn, hêjayî zehmetên kişandina wê ye. Niha pêkan e hûn ji xwe bipirsin: " pes çima tu yek ji nigarên din ku min kişandine ewqas bi heybet nînin?" – baş e, bersiva wê pirsê pir hêsan e: min hewla xwe daye lê min nekariye

wan baş bikişînim. Lê dema min nigara Baûbabê dikişand min hîs dikir ew mijara gelekî girîng e loma jî kelecan ketibû laşê min.

6

Ax Şahzadeyê min ê qiçik! Wisa bû ku hêdî hêdî min çîroka jiyana te ya sînorkirî fam kir. Heta demeke dirêj sergermî û kêfxweşiya te tenê temaşekirina li rojê bû dema ew diçû ava. Sipêda roja çaremîn bû ku ew xala ji min ra eşkere bû, yanê dema te bi min ra got:

- Ez ji avabûna rojê pir hez dikim. Em biçin li daketin û ber bi ava çûna rojê binêrin…

Şahzadeyê Qiçik 23

Hmm, lê divê em li bendê bimînin…

- Li benda çi?

- Li benda rojavabûnê.

Di serî da wisa xuya bû ku tu mat mayî, ji dû ra bişirînek li ser lêvên te şîn da û te bi min ra got:

- Ez hertim wisa difikirim ku li mala xwe me.

Ya rast ew e dema li Amirîkayê nîvro ye, li Fransayê roj ber bi ava diçe. Eger mirov di nava deqeykê da xwe bigihîne Fransayê, dikare li wir avabûna rojê temaşe bike. Lê mixabin Fransa gelekî dûr e, lê eger te di gerstêrka xwe da hinekî kursiya xwe vir da wir da bikişanda, te dikarî her çend caran ku te bixwesta avabûna rojê mêze bikira…

- Min di rojekê da çil û sê caran avabûna rojê dît!

Û piştî kêliyekê got:

- Dema dilê mirov teng dibe, mirov ji avabûna rojê hez dike…

Şahzadeyê Qiçik 24

- Pes xuya ye wê rojê ku te çil û sê caran avabûna rojê temaşe kiriye, te pir diltengî dikiriye?

Lê Şahzadeyê Qiçik bersiva wî neda.

7

Roja pêncemîn, dîsa bi behskirina li ser pêz, xaleke din ji jiyana Şahzadeyê Qiçik ji min ra eşkere bû. Wisa xuya bû ku demeke dirêj li ser fikirî be, ji nişkê va ji min pirsî:

- Pezên tûm û şitilên daran dixwin, gulan jî dixwin?

- Belê, pez her tiştî peyda ke, dixwe.

- Yanê gulên strîdar jî dixwe?

- Belê, wan jî dixwe.

- Pes sûd û faydeya striyan çi ye?

Min çi dizanî? Di wê demê da ez mijûlî vekirina pêçekî şidandî yê mekîneya balafirê bûm. Bêhna min pir teng bû, ji ber ku hêdî hêdî li min eşkere bû xerabiya mekînê pir zêde ye û ez ditirsiyam ku avê min ê vexwarinê teva bibe û rewşa min xerabtir jî bibe.

- Te negot strî ji çi ra rind in?

Dema Şahzadeyê Qiçik pirsek ji min dikir êdî dev jê bernedida. Ji ber ku wê piçekî morala min xerab kiribû, min bersiveke xweş neda wî:

- Strî bi kêrî tu tiştî nayên. Tenê nîşaneya nebaşbûna gulan in.

Lê piştî kêliyekê ku bêdeng ma, kelogirî got:

Şahzadeyê Qiçik 25

- Ez ji te bawer nakim! Gul lawaz in. sadedil in. û ji bo ku hinekî dilê xwe bihêztir bikin striyan jî di laşê xwe da çê dikin û fikir dikin hebûna striyan di tenê wan da, wan tirsnak dike…

Min bersiva wî neda. Di wê gavê da, min bi xwe ra got: "eger ev pêça zêdetir li ber xwe bide û ve nebe, ez ê bi çakûçê wê bipişirînim." Şahzedeyê qiçik dîsa fikir û ramanên min tevlihev kirin:

- Pes tu wisa difikirî ku gul…

- Na weleh, na! ez tu xeyalan nakim. Karên min ên girîngtir jî hene.

Li min dinêhêrî û şaş mabû:

- Karên girîng?

Ew li çakûça di destên min ên pîs û tijî rûn da, dinihêrî. Ez ku li ser laşê balafirê xwar bûbûm, bi nêrîna wî gelek kûtî dihat xuyakirin.

- Tu jî wekî mirovên salmezin gep dikî ha!

Min ji gotinên wî yên tawanbar hinekî şerm kir lê wî bi dilhişkî û bê rehmî domand:

- Tu her tiştî tevlihev dikî, her tiştî şaş fam dikî!

Bi rastî ku ew pir hêrs bûbû. Şemalê porê wî yê rengzêrîn şeh dikir.

- Ez gerstêrkekê nas dikim ku li wir mêrikekî rûswîr heye. Wî qet gul bêhn nekirine, wî qet li gerstêrkan nenihêriye, wî qet ji tu kesê hez nekiriye û wî ji bilî dirav

Şahzadeyê Qiçik 26

berevkirinê tu karekî din nekiriye û ew jî wekî te her roj dubare dike ku: "ez mirovekî girîng im, ez camêrekî cidî me!" û pozê xwe bilind dike û bêvila xwe tijî ba dike. Lêbelê ew ne mirov e. ew kuvark e.

- Ew çi ye?!

- Kuvark!

Niha ji şideta hêrsbûnê rengê rûyê wî firîbû:

- Tevî ku bi milyonan sal in gul striyan jî di laşê xwe da diperwerînin lê dîsa jî pez wan dixwin. Niha ewqas hewldan û zehmet ji bo têgihîştina ka çima gul striyên qet bi kêrî wan nayên çê dikin, girîng nîne? Gelo şerê di navbera gul û pêz da ne girîng e? gelo ev mijara ji karê mêrikê rûswîr ku tenê dirav berev dikir û dihejmart girîngtir nîne? Û eger ez gulekê nas bikim ku tax be û di gerstêrka min da tenê yek ji wan hebe û ji bilî wir li hemû dinyayê peyda nebe, wê çaxê pezek bikaribe wê

Şahzadeyê Qiçik 27

bixwe û bêyî ku bizane çi dike bi gezekê wê xopan bike, gelo ev tişt ne girîng e?

Rengê rûyê wî swîr bûbû û dîsa got:

- Eger kesek ji gulekê hez bike ku di nav milyonek stêrk da tenê yek ji wan hebe, ji bo ku ew kes hest bi bexteweriyê bike tenê li wê stêrkê temaşe bike bes e. Ev kes, bi xwe ra dibêjin: "gula min di nav yekê ji wan stêrkan da ye." Lê eger pez wê gulê bixwe, wekî ku hemû stêrk bi yekcarî xeva çûbin, gelo ew ne girîng e?

Û zêdetir ji wê nekarî gep bike û bê hemdî xwe giriya. Êvarê bi ser me da daket. Min jî dest ji amûrên xwe berdabû. Min laqirdiyê xwe bi çakûç, pêç, bazin, tîbûn û mirinê dikir. Di nav stêrkekê da, di nav gerstêrkekê da, di nav gerstêrka min da, Şahzadeyekî qiçik heye ku ez niha gerek dilê wî hilînim! Min ew hemêz kir û tavda. Min bi wî ra got: "gula tu jê hez dikî, di metirsiyê da nîne. Ez ji bo nigara berxikê ra jî dê pozbendekê bikişînim… ji bo gula te ra jî ez ê amûreke bergiriyê bikişînim…ez…" edî min nizanîbû çi bibêjim. Min hîs dikir ku ez pir xav û bêtecrube me. Min nizanîbû çawa di ber dilê wî da herim û wî haş bikim. Wey ku dinyaya hêstiran çiqas ecêb e!

8

Min pir zû rêya naskirina wê gulê peyda kir:

Di gerstêrka Şahzadeyê Qiçik da hertim baqeke gulên sade û asayî derdiketin. Gulên ku tenê pelek gul didan û şûneke zêde jî nedigirtin. Rê jî ji kesekî ra nedigirtin. Beyanî di nav giyayan da derdiketin û êvarê jî permûç dibûn û ji holê radibûn. Lê gula wî ji toveke nenas û nediyar derketibû. Û Şahzadeyê Qiçik bi

Şahzadeyê Qiçik 28

dilsoziyeke bêhempa ji şitila nazik ku qet li yên din nedişibî, haydar bû. Lê diçû ku ew şitila cûreyek nû ji dara Baûbabê be. Lê şitil zû ji bilindbûnê û mezinbûnê da ket û hêdî hêdî pim da qunçe vekirin. Wisa kete dilê wî ku tiştekî mucizane ji şitilê derdikeve. Lê belê gulê di penahgeha xwe ya kesk da xwe xemiland û xwe xweşik da xuyakirin. Wê bi weswasî rengên xwe hildibijartin. Hêdî hêdî cil û berg li xwe dikirin û gulperên xwe yek û yek li xwe girê didan. Dilê wê nedixwest weke swîrgulan bi cil û bergên çilmisî were der û wisa bêhal bê xuyakirin.

Wê dixwest tenê dema ku rexşan û xweşike bê dîtin!.. Wey ku çiqas guleke nazdar bû! hin rojan tenê dema xwe li ser xwexemilandineke ecêb derbas kiribû heta ku rojekê serê sibê bi hilhatina rojê ra wê jî xwe bi dinyayê nimand.

Û tevî ku ewqas bi baldarî jî xwe xemilandibû, bawîşkek hatê û got:

- Oh, teze ji xewê rabûme… lêborînê dixwazim… porê min pir qij û perîşan e…

Wê demê Şahzadeyê Qiçik nekarîbû pesna wê nede:

- Tu çiqas bedew î!

Şahzadeyê Qiçik 29

Gulê bi aramî gotibû:

- Erê rast e. ji ber ku ez û rojê di demeke yeksan da hatinê dinyayê…

Şahzadeyê Qiçik têgihîşt ku gula li hemberê wî, ne nefsqiçik e, lê bi rastî jî gelek bi kelecan bû!

- Ji min tirê niha dema xwarina xurîniyê ye. Ji kerema xwe ji min ra çareyekê bibîne.

Şahzadeyê Qiçik bi awayekî perîşan çûbû û hinek ava hênik anîbû û gul av dabû.

Wisan bû ku gulê bi pozbilindî û çêkirina bedgumaniyan ew êşandibû. Weke mînak rojekê jî qala çar striyên xwe ji Şahzadeyê Qiçik ra kiribû:

Şahzadeyê Qiçik 30

- Neke pilingên leptûj bên û ziyanê bigihînin min!

Şahzadeyê Qiçik nerazîbûna xwe nîşan dabû û gotibû:

- Di gerstêrka min da piling tunene lê eger hebin jî ew giyayê naxwin.

Gulê bi aramî lê vegerandibû:

- Ez ku giya nînim.

- Bibore…

- Ez qet ji pilingan natirsim, lê ji şemalê ditirsim. Ê we kulav tuneye?

Şahzadeyê Qiçik 31

Şahzadeyê Qiçik di dilê xwe da gotibû:

- Tirs ji şemalê, ez ku bi dest xwe da mame…meger şemal ziyanê digihîne giyayê? Ev gula pir ecêb e!

Êvarê ser min biniximîn. Hewayê vir pir sar e. ez hatime şûneke nebaş! Cihê ez berê lê bûm…

Lê gotina xwe di nîvê da berda. Ew tovek bû û derfeta wî ji bo naskirina dinyayên din tunebû. Ji ber ku dereweke wisa eşkere kiribû hinekî şermende bûbû û du sê caran di ber xwe da kuxiyabû ku kiryar û sûcê Şahzadeyê Qiçik bîne bîra wî:

Şahzadeyê Qiçik 32

- Kalava min li kû ye?

- Min dixwest herim ji tera kulavekê bînim, te ez dame gepkirinê.

Û ji ber ku gulê dixwest wî zêdetir sûcdar bike hêy zêdetir kuxiyabû,

Tevî ku dilê Şahzadeyê Qiçik tijî evîn û dilovaniyê bû jî lê hinekî li gula xwe bedbîn bûbû. Rebenê gotinên wê yên serserî hinekî cidî girtibûn û xwe bêçare kiribû.

Rojekê sifreya dilê xwe ji min ra ve kir û got: "min gerek li gotinên wê guhdarî nekira. Gerek mirov tu carî li gotinên gulan guhdarî neke. Gerek tenê li wan binêrî û wan bêhn bikî. Ew gula min bû ku gerstêrka min bêhndar dikir lê min nizanîbû çawa ji wê kêf bikim. Mijara pilingê leptûj ez pir dilgiran kiribûm divê ku min hinekî dilê xwe nerm bikira…"

Dîsa rojeke din hate ba min û got: " wê demê min tiştek fam nedikir. diviya ku min li ser kirdara wê fikir bikira, ne li ser gotinên wê… wê dilê min vêdixist, ez bêhndar dikirim. Ez gerek qet ji wê nereviyama. Min gerek mêhr û mihebeta ku li paş van fêlbaziyên wê yên zarokane hebûn fam bikira. Wey ku van gulana çiqas ecêb in! lê ez jî ewqas xav û bêtecrube bûm ku nezanibim çawa ji wê hez bikim.

Şahzadeyê Qiçik 33

9

Bi gumana min Şahzadeyê Qiçik ji bo revînê ji zirweyek (ref) balinde yên koçer alîkarî wergirt.

Sibeya roja ku dixwest here, wî gerstêrka xwe paqij û rêkûpêk kir.

Agirpijên wir ên ku dixebitîn, bi baldarî pak û temîz kirin: du agirpijên çalak hebûn ku sewa amadekirina taştê pir rind bûn. agirpijeke neçalak jî hebû. Lê bi nêrîna wî "mirov ku pêşeroja xwe nizane!" loma jî agirpija neçalak jî bi baldarî paqij kir. Eger agirpij baş bên pagijkirin dê baş bişewitin. Agirpij jî weke sobeyê ne. lêbelê em di gerstêrka xwe da pir qiçik in û em nikarin agirpijên ser erdê paqij bikin, ji ber vê yekê jî ew gelekî

Şahzadeyê Qiçik 34

ji me ra pirsgirêkan çê dikin. Şahzadeyê Qiçik bi dilekî xemgîn şitilên herî dawîn ên Baûbabê jî qir kirin. Wisa difikirî ku ew ê careke din venagere wir. Wê rojê hemû karên xwe bi lezet û kêfxweşî bi dawî anîn. Dema ku dixwest sewa cara dawîn gula xwe av bide û ser wê biniximîne, hinekî dilê wî tijî bibû û hêstir bi ser da rijiyan.

Bi gula xwe ra got: bi xatirê te!

Lê gulê tu bersiv neda.

Dîsa got: bi xatirê te.

Gul kuxiya, lê ew kuxik ne ji arsimê bû. Di encamê da hate zimên û got:

- Ez ehmeq bûm. Li min bibore. Hewl bide ku xwe xweşbext bikî.

Ji vê yekê ku gulê weke hertim ew tawanbar nekiribû, Şahzadeyê Qiçik pir mat mabû. Kulav bi dest wî da bû lê ew li şûna xwe mîna darekê, hişk mabû. Wî ji dilnermî û muhebeta gulê fam nedikir.

Gulê bi wî ra got: - erê ez ji te hez dikim. Sûca min e ku tu ji vê yekê bê xeber î. Ev ne girîng e. lê tu jî weke min ehmeq bûyî. Niha jî hewl bide xwe xweşbext bikî… vê kulavê jî bavêje wî alî, ez êdî van tiştan naxwazim.

- Pes şemal çi…

- Na, ez wisan nexweş jî nînim. Hewayê hênik a şevê ji min ra rind e. ma tu nizanî ez gul im ha!

- Ji caneweran çawa xwe diparêzî?

Şahzadeyê Qiçik 35

- Eger ez bixwazim bi minminîkan ra bibime heval divê hin bihukên çempal jî bihemilînim. Minminîk pir bedew in. Tu ji min dûr dikevî, eger minminîk jî neyên dîtina min pes kî tê? Ez ji canewerên mezin jî ditirsim, helbet ê min jî çenga striyên tûj hene.

Û bi awayekî zarokane û sade çar striyên xwe nîşanî min dan, piştre got:

- Çiqas dixwazî bi ser xwe da bigerî, ez ji vê yekê nerahet im. nika ku te biryar daye biçî, here!

Gulê nedixwest Şahzadeyê Qiçik hêstirên wê bibîne. Wey ku ew çiqas guleka mexrûr bû!..

10

Şahzadeyê Qiçik xwe di nava gerstêrkên 325, 326, 327, 328, 329 û 330 da dît. Loma jî hem ji bo sergermiyê hem jî ji bo tişt fêrbûnê li hemû gerstêrkan yek û yek geriya. Gerstêrka yekem a padişahekî bû ku bi cil û bergên padişahiyê li ser texa xwe yê sade û asayî lê şahane rûniştibû. Dema ku padişê Şahzadeyê Qiçik dît bang lê kir:

- Hmm, ev jî pale û reyet!

Şahzadeyê Qiçik ji xwe pirsî: - wî heta nika qet ez nedîtime, çawa min nas dike?

Wî nizanîbû ku dinya sewa padişahan pir qiçik û sade ye û ji wan ra hemû xelkê dinyayê pale û reyet in.

Şahzadeyê Qiçik 36

Niha ku padişêh ji xwe ra kesek dîtibû ku jê ra padişahiyê bike, lingê wî erd nedigirtin, di hewê ra difirî:

- Were te ji nêzik da bibînim.

Şahzadeyê Qiçik lê digeriya ku cihekî sewa rûniştinê bibîne lê cil û bergên padişêh, gerstêrk bi giştî dagirtibû. Loma ew neçar ma li ser piyan bisekine. Lê ji ber ku pir westiyabû bawişkî.

Padişêh pê ra got: - li huzûra padişêh bawişkîn yanê ku te li padişêh bêhurmetî kiriye. Vî karî ji te ra qedexe dikim. Şahzadeyê Qiçik ku pir şerm kiribû, got:

Şahzadeyê Qiçik 37

- Nikarim pêşiya vê yekê bigirim. Ez rêyeke dirêj hatime û qet jî ez raneketime…

Padişêh got: - baş e, baş e, pes ez destûrê didime te ku tu nika bibawişkî. Haydê bibawişk. Ev ferman û destûr e ji te ra.

Şahzadeyê Qiçik got: - axir wisan ez bilez ku nikarim. Padişêh gotê: - him! Him! Baş e. pes ez carinan emr dikim ku tu bibawişkî û carinan jî na…

Lezgîn û gung û bêwate xeber dida, xuya bû ku bêhna wî teng bûye. Ji ber ku padişah wisa difikirî, her fermanê ku ew dide gerek pêk were û her kes divê bejnê xwe li ber wî bitewîne. Li hember kesên ku fermana wî pêk nedianîn jî qet rehm û kerem ji xwe nîşan nedida. Padişahekî zordar bû lê ji ber ku mirovekî baş bû qet karên bêmentiq ji kesî nedixwestin. Wek mînak digot:

- Eger ez ji fermandarekî xwe bixwazim ew bibe wekî balindeyeka deryayî û ew fermanberêtiyê neke, ew yek ne gunehê wî ye, lê gunehê min e.

Şahzadeyê Qiçik bi şerm û fedî got:

- Gelo dikarim li vir rûnim?

Padişah hinekî mirûzê xwe ve kir û got: - ez ferman didim tu rûnî.

Lê belê Şahzadeyê Qiçik mat mabû: axir ew gerstêrka qiçiktir ji van gotinan bû! bi rastî padişêh ji kê ra hukimdarî dikir? Got: mîrê min, min efû bike ku ez ji te pirsan dikim…

Padişêh bi lez got: - ez ferman didim tu ji min pirsan bikî.

- Mîrê min tu li çi tiştî hukimdariyê dikî?

Şahzadeyê Qiçik 38

Padişêh got: - li hemû tiştî.

- Li hemû tiştî?

Padişêh bi awayekî şahane xwe livand. Amaje bi gerstêrka xwe, gerstêrkên din û hemû stêrkan kir.

Şahzadeyê Qiçik pirsî? – yanê li wan hemiyan?

Padişêh lê vegerand: - belê, li wan hemiyan.

Axir ew padişahekî asayî nebû, ew gerdûnî bû.

- Wê demê hemû stêrk jî fermanên te dipejirînin?

Padişêh got: - helbet belê, bê rawestan ew fermanên min pêk tînin. Ez nafermaniyan bi tu awayî napejirînin.

Hêzeke wisan, Şahzadeyê Qiçik matmayî hiştibû. Dilê wî jî dixwest hêzeke wî ya wisan hebe. Bêyî ku ew kursiya xwe ji şûnê bilivîne ew karibe di rojekê da avabûna rojê ne tenê çil û çar caran lê belê heftî û heta sed caran jî bibîne! Û ji nişkê ve kete bîra gerstêrka xwe û bêriya wê kir. Wî bi wêrekî ji padişêh tiştek xwest:

- Dilê min dixwaze li avabûna rojê binêrim… li min kerem bike û ferman bide bila roj ber bi ava va biçe.

- Eger ez ferman bidime fermanderekî xwe ku weke bihukekê ji ser vê gulê bifere ser gula din yan ez bixwazim ew çîrokeke xembar binivîse yan bibe weke mirîşkeke deryayî û ew fermana min pêk neyîne. Kî ji me sûcdar e? Ez ya ew?

Şahzadeyê Qiçik ne hilanî û ne danî, got: - Tu.

Şahzadeyê Qiçik 39

Padişêh got: - durist e. gerek ji her kesî li gor şiyana wî, tiştan jê bixwazî. Divê ku hêz piştê xwe bi aqilê girê bide. Eger tu ji gelê xwe bixwazî her tiştî xwe birijînin deryayê ew ê şoriş bikin. Em mafdar in ji wan bi hêvî bin. Ji ber ku em fermanên mentiqî û aqilane didin wan.

Şahzadeyê Qiçik tu caran pirsa xwe ya ku carekî jî pirsî bû ji bîr nedikir, got:

- Pes avabûna rojê ku min dixwest lê binêrim, çi?

- Tu yê avabûna rojê bibînî. Ez ê bibêjim roj ber bi ava va biçe, lê ji ber berjewendiya welêt û siyaseta welatparêziyê ez ê hinkî din jî rawestim heta ku rewş baştir bibe.

Şahzadeyê Qiçik pirsî:

- Dê kînga rewş baştir bibe?

Padişêh li salnameyeke mezin nihêrî û got:

- Ha, ha …îşev derdora saet heft û çil deqîqe! Wê demê tu yê bibînî fermana min çawa pêk bê.

Şahzadeyê Qiçik bawişkî. Xemgîn bû ku çima avabûna rojê nedîtiye. Hinekî jî westiyabû. Loma jî ji padişêh ra got:

- Niha karekî min li vir tuneye, ez dixwazim herim!

Padişêh ku bi hebûna reyetekî dilê xwe xweş kiribû, lê vegerand:

- Mere, mere! Ez ê te bikim wezîrê xwe.

- Wezîrê çi?

- Wezîrê … wezîrê… dadê!

Şahzadeyê Qiçik 40

- Lê li vir tu kes tune ku ew were darizandin!

Padişêh got:

- Çawa xuya dike kes tune? Ez ku hîn derdora welatê xwe negeriyame. Ez nika pir kal bûme, şûna ragirtina çerxê min jî tune û meşîn jî min diwestîne.

Şahzadeyê Qiçik ku xwe xwar kiribû aliyê din ê gerstêrkê bibîne, got:

- Ohh! Min baş li wî alî gerstêrkê jî nihêrî. Li wir jî kesek tune…

Padişêh lê vegerand:

- Pes gerek tu xwe darizînî. Karê herî dijwar ew e ku tu xwe darizînî. Eger tu bikarî derbareyê xwe durist ray bidî diyar e ku tu dadwerekî rastîn î.

Şahzadeyê Qiçik got:

- Ez li her derê bim dikarim derbareyê xwe ray bidim. Êdî nepêwîst e ku li vir bimînim.

Padişêh got:

- Ha…ha..!...bi gumana min di guçekî gerstêrka min da mişkeke pîr heye. Ez şevê dengê wê dibihîzim. Tu dikarî wê darizînî. Her wext dilê te xwest tu fermana darvekirina wê bide. Bi vî awayî dê jiyana wê girêdayî dad û edaleta te bibe. Lê divê ku tu her carî jî lê biborî û wî nedî kuştin. Axir ew tenê candarê vir e û gerek tu wê ji dest nedî.

Şahzadeyê Qiçik bersiv da:

Şahzadeyê Qiçik 41

- Ez naxwazim tu kesî bi darvekirinê bê cezakirin. Gerek ez biçim.

Padişah got: - na

Lê belê Şahzadeyê Qiçik xwe ji bo çûnê ra amade kiribû û ji aliyekî va jî nedixwest ku padişahê kal ji wî narahet bibe:

- Mîrê min eger tu dixwazî ez fermanên te pêk bînim, ji kerema xwe hin fermanên aqilmend bide min. wek mînak ferman bidî min ku ez di nava deqeyekê da biçim. Ez wisa difikirim ku her tişt jî ji bo wê fermanê niha amade ye…

Ji ber ku padişêh tu bersiv nedayê, Şahzadeyê Qiçik dudil mabû ku here yan na, piştre kesereke kûr ji dil da kişand û bi rê ket. Wê demê padişêh bilez bang kir: -te dikim nûnerê xwe!

Rewşeke rewneqdar bû. Şahzadeyê Qiçik wisan ku diçû, di dilê xwe da digot: - mirovên salmezin bi rastî pir ecêb in!

11

Şêniyê gerstêrka duyem, mirovekî jixwerazî bû. dema ku mriovê jixwerazî Şahzadeyê Qiçik dît, ji dûr va bang lê kir: - beh beh! Mirovekî pesndêr jî ku hat min bibîne!

Axir ji bo jixweraziyan mirovên din hemû pesndêr in.

Şahzadeyê Qiçik got: silav! Te çiqas kumekî qiçik daye serê xwe.

Şahzadeyê Qiçik 42

Mirovê jixwerazî lê vegerand: - Ev kuma ji bo ku ez bikarim sipasdariya kesên li min silav dikin û pesna min didin e. Bedbextane kesek ji vir derbas nabe!

Şahzadeyê Qiçik ku tiştek jê fam nekir got:

- Çi?

Mirovê jixwerazî got: - çepikek lê de.

Şahzadeyê Qiçik 43

Şahzadeyê Qiçik çepik lêxist û di heman demê da mirovê jixwerazî kumê xwe bi nîşana rêzgirtinê ji serê xwe hilda.

Şahzadeyê Qiçik di dilê xwe da got: "dîtina vî mirovî balkêştir ji dîtina padişêh bû." û dîsa çepik lêxist û mirovê jixwerazî carekî din kumê xwe hilda û sipasiya wî kir. Piştî pênc deqeyan Şahzadeyê Qiçik ji wê lîstika yeksan westiya û pirsî: - divê çi kar were kirin ku kum ji serê te bikeve?

Lê mirovê jixwerazî dengê wî nebihîst. Axir mirovên jixwerazî tenê axivtinên ku pesna wan didin dibêhîzin û ji bilî vê yekê ew tiştekî din nabihîzin û kerr in.

Wî ji Şahzadeyê Qiçik pirsî: - gelo bi rastî tu min mirovekî hêjayî pesndanê dibînî?

- Pesn û xeberên xweş yanê çi?

- Yanê tu qebûl dikî ku mirovê herî xweşbejnûbal, herî dewlemend û herî zîrek ê vê gerstêrkê ez im.

- Axir li vê gerstêrkê ku tenê tu yî û kumê te.

- Lê dîsa jî tu pesna min bide û vê keremê ji min ra bike.

Şahzadeyê Qiçik serê xwe kire ber xwe û got: baş e, min pesna te da. Lê çawa ev tişt ji te ra balkêş e?

Şahzadeyê Qiçik wisan ku diçû, di dilê xwe da digot: - mirovên salmezin bi rastî pir ecêb in!

12

Di gerstêrka din da serxweşek (mest) dijiya. Şahzadeyê Qiçik demeke kurt li cem wî ma lê xemgîniyeke mezin kete dilê wî.

Şahzadeyê Qiçik 44

Wî bi serxweşê ku bê deng û aram li pişt maseya sertijî şûşeyên meyê rûniştibû ra got: - tu çi dikî?

Serxweş bi dengekî xemgîn lê vegerand: - meyê vedixwim.

Şahzadeyê Qiçik pirsî: - sewa çi meyê vedixwî?

Serxweş got: - ji bo ku ji bîr bikim.

Şahzadeyê Qiçik ji bo rewşa wî hinekî li ber xwe ket û got: dixwazî çi tiştî ji bîr bikî?

Serxweş serê xwe kire ber xwe û got: - bêçarebûna xwe.

Şahzadeyê Qiçik ku dixwest piçekî derd û kulên wî siviktir bike pirsî: bêçarebûna ji ber çi ?

Şahzadeyê Qiçik 45

Serxweş lê vegerand: - bêçarebûna ji ber meyvexwarinê û serxweşbûnê.

Serxweş ev gotina got û bi giştî xef û bêdeng ma. Û Şahzadeyê Qiçik matmayî riya xwe girt û çû.

Wisan ku diçû, di dilê xwe da got: - mirovên salmezin bi rastî pir ecêb in!

13

Şahzadeyê Qiçik di gerstêrka çaremîn da rastî bazirgenekî hat. Bazirgan ewqas mijûlî karê xwe bû pê nehesiya ku Şahzade hatiye ba wî.

Şahzadeyê Qiçik got: - silav. Arê sîgara te xeva çûye.

- Sê û du dibe pênc. Pênc û heft dewazdeh, dewazdeh û sê panzdeh. Panzdeh û heft bîst û du. Bîst û du û şeş, bîst û heşt. Dema min tune sîgarê vêxim. Bîst û şeş û pênc, sî û yek. Off! Pes bi giştî dibe pêncsed û bîst û heşt û du hezar û heftsed û sî û yek.

- Pêncsed milyon çi?

Şahzadeyê Qiçik 46

- Ha? Tu hîn li vir î? Pêncsed û yek milyon tişt. Nizanim. Ewqas ez mijûl im ku!.. ez mêrekî cidî me û qala heşt neh diravan nakim!.. du û pênc heft…

Dema ku Şahzadeyê Qiçik tiştek dipirsî, heta ku bersiva pirsa xwe wernegirta dev jê bernedida, dubare kir:

- Pêncsed milyon çi?

Bazirgên serê xwe rakir:

Ez niha pêncî sal in ku şêniyê vê gerstêrkê me tenê sê caran rastî hin pirsgirêkan hatime. Yekem car bîst û du salan berî niha bû, kêzikek nizanim ji ku derê hatibû. Dengê wê pir hovane bû. Ew bû sedem ku ez di zêdekirinekê da çar caran şaş bikim. Cara duyem yazdeh salan berî niha bû, hestîêşê emanê min birîbû, min nizanîbû çi bikim. Ez werzişê nakim yanê dema min tune ku ez bixwazim karên wisa bêsûd bikim! Ez cidî me… niha jî cara sêyemîn e!.. li ku derê bûm? Pêncsed û yek milyon û…

- Ewqas milyonên çi?

Bazirgên fam kir ku ew ji pirsên Şahzadeyê Qiçik dê nefilite. Got: - bi milyonan ji van tiştên qiçik ku pirî caran di hewayê da tên dîtin.

- Mêş?

- Na lawo! Ev tiştên qiçik ku diçirûskin.

- Mêşên hingivê?

- Na lo! Ev tiştên qiçik û zêrîn ku mirovên bêkar dibin nav xewn û xeyalan. Lêbelê ez cidî me û dema min a ketina nav xeyalan tune.

- Aha, mebesta te stêrk in?

- Erê, stêrk.

Şahzadeyê Qiçik 47

- Baş e, pêncsed hezar stêrk bi çi kêrî te tên?

- Bi çi kêrî min tên?

- Belê.

- Tişt nakim, tenê dibim xwediyê wan.

- Stêrkan?

- Erê.

- Axir ez rastî padişahekî hatim ku …

- Padişah nabin xwediyê tiştekî, lêbelê ew tenê li wan hukimdariyê dikin. ev du tiştana pir bi hevdu ra ferq dikin.

- Baş e, çima tu dixwazî bibî xwediyê wan?

- Ku ez dewlemend bibim.

- Baş e, dewlemend bûn bi çi kêrî te tê?

- Ji bo ku eger stêrkeke nû bê peydakirin, ez bikarim wê bikirim.

Şahzadeyê Qiçik di ber xwe da got: "mentiqa vî mirovî jî weke mentiqa mirovê serxweş e." lê dîsa jî jê pirsî:

- Mirov çawa dikare bibe xwediyê stêrkekê?

Bazirgên bi mirûzeke tirş pirsî: - ev stêrkana yên kê ne?

- Çi zanim? Ên tu kesî jî nînin.

- Pes ên min in. ji ber ku ewil min ev fikira kiriye.

- Tenê ev bes e?

- Helbet ku bas e. Eger tu gewherekî peyda bikî ku yê tu kesî nebe, ew ê bibe yê te. Eger tu doravekê (cezîrê) peyda bikî ku yê tu kesî nebe, ew ê bibe ya te. Eger tu li tiştekî bifikirî ku heta wê demê negihîştibe mêjiyê tu kesî, dê bi navê te bê qeydkirin. Û ji ber ku heta niha tu

Şahzadeyê Qiçik 48

kes li stêrkan xwedî der neketiye , ez bûme xwediyê wan.

Şahzadeyê Qiçik got: ev tiştên ku te gotin hemû rast! Nika dixwazî çi bikî?

Bazirgên got: - wan bi rê va dibim û wan dihêjmirim û dihêjmirim. Helbet karekî zehmet e lê ez mirovekî pir cidî me.

Şahzadeyê Qiçik ku ji gotinên wî şaş mabû got:

- Eger stûpêçeke min ê hewrîşemî hebe, ez dikarim wê li stûya xwe bişerînim û bi xwe ra bibim. Eger guleke min hebe ez dikarim wê biçinim û bi xwe ra bibim. Lê tu ku nikarî stêrkan biçinî!

- Na. lêbelê dikarim wan li bankekê dayînim.

- Min mebesta te fam nekir, bank yanê çi?

- Yanê stêrkên xwe dihêjmirim û hejmara wan li ser kaxezekê dinivîsim û di sindoqekê da datînim û derê sindoqê jî qufil dikim.

- Yanê hemû tiştê ku tu dikî ev e?

- Erê, wisan bes e.

Şahzadeyê Qiçik kete nava ramanan. "balkêş e. hinekî jî helbestane ye. Lê ew ne karekî pir girîng e ku wisa jî were cidîgirtin." Axir fikir û nêrîna wî li gel mirovên salmezin pir ferq dikirin.

Dîsa got: -guleke min heye ku ez her roj wê av didim. Sê agirpijên min jî hene ku di her hefteyekê da carekî wan paqij û temîz dikim. Ez agirpijê xwe yê xevaçûyî jî pak û temîz dikim. Ji ber vê yekê jî ez ji gulê û agirpijên xwe ra sûdmend im. Tu ji bo stêrkên xwe ra çi karî dikî?

Şahzadeyê Qiçik 49

Bazirgên dixwest bersiva wî bide lê tiştek sewa gotinê tune bû. Û Şahzadeyê Qiçik riya xwe girt û çû wisan ku diçû, di dilê xwe da got: - mirovên salmezin bi rastî pir ecêb in!

14

Gerstêrka pêncemîn tiştekî ecêb bû. ew ji hemû gerstêrkên din qiçiktir bû yanê tenê bi qasî şûna fanûsekê û fanûsvanekî li wir şûn hebû.

Şahzadeyê Qiçik ji vê raz û nepeniyê têdernedixist, ku di nav asmana xwedê da gerstêrkek heye û li ser wê jî kesek nedijiya. Hikmeta hebûna fanûs û fanûsvanê çi bû, wî fam nedikir. lê dîsa jî di dilê xwe da got:

- Renge ku ev mirov ehmeq be. lê diyar e ku ew ji mirovên weke Padişah, Jixwerazî, Bazirgan û Serxweş bêaqiltir nîne. Herî kêm karê ku dike bê wate nîne. Ew fanûsa xwe vêdixe mîna ku ew stêrkek yan gulekê li dinyayê zêde dike û dema ku fanûsê xeva dike mîna ku

Şahzadeyê Qiçik 50

gul ya stêrka xwe dike xewê. Sergermiyeke rind e û tiştên rind, sûdmend in jî.

Dema ku li ser gerstêrkê daket, bi rêzdarî li fanûsvên silav kir:

- Merheba. Çima te fanûs xeva kir?

- Destûr e ku xeva kim. Beyanîbaş!

- Destûr çi ye?

- Destûr ev e ku fanûsê xeva kim. Şevbaş!

Û dîsa fanûs vêxist?

- Pes çima te dîsa vêxist?

Fanûsvên lê vegerand: - êdî destûr e de.

Şahzadeyê Qiçik got: -ez ku qet têdernaxim.

Fanûsvan got: -tiştekî ku tu jê têderxî tune. Destûr destûr e. rojbaş!

Û dîsa fanûs xeva kir.

Piştre bi destmala xwe ya swîr xwedana eniya xwe hişk kir û got:

- Karekî pir zehmet e. pêştir pir baş bû: her roj beyanî min ew xeva dikir û êvarê jî min ew vêdixist. Yanê di rojê da dema min ji bo bêhnvedanê û rahetiyê zêde hebû û êvaran jî ez radiketim…

- Gelo piştre destûr hate guhertin?

Fanûsvên got: -na ji ber ku destûr nehate guhertin ez wisan bedbext bûme. Gerîna gerstêrkê sal bi sal bileztir dibe lê destûr wek roja yekem maye û nehatiye guhertin.

Şahzadeyê Qiçik 51

- Çima?

- Niha ku gerstêrk di nava deqîqêkê da carekî bi dorê xwe ra digere, dema min sewa bêhnvedanê tune: di nava deqîqêkê da fanûsê vêdixim û xeva dikim.

- Gelekî ecêb e! di gerstêrka te da şevûrojek tenê ji deqîqêkê pêk tê!

Fanûsvên got: -qet ecêb nîne. Niha ez û te mehek e ku bi hev ra gep dikin.

- Mehek?

- Erê. Sî deqîqan. Sî şevûrojan! Şevbaş!

Û dîsa fanûs xeva kir.

Şahzadeyê Qiçik li fanûsvên nihêrî û his dikir ku pir ji wî hez dike, ji ber ku ew mirovekî qanûnmend bû. Şahzadeyê Qiçik kete bîra rojên ku wî bi xwe jî avabûna rojê tenê bi guhertina cihê kursiya xwe temaşe dikir. Wî dixwest ku alîkariya hevalê xwe bike:

- Ez rêyekê dizanim ku tu her demê bixwazî dikarî bêhna xwe vedî.

Fanûsvên got: - çi ye ka ji kerema xwe ji min ra bibêj.

Mirov dikare tenbel bibe lê di heman demê da dikare li ser soza xwe vefadar jî bimîne.

Şahzadeyê Qiçik wisa domand:

Gerstêrka we ewqas qiçik e ku tu bi sê gavavêtinan dikarî li hawirdorê wê bigerî. Eger tu tenê hinekî aram û hêdî gavan bavêjî, tu yê tim di bin tîrêjên rojê da bimînî. Her wext ku

Şahzadeyê Qiçik 52

bixwazî dikarî bimeşî û bêhna xwe vedî... Wê demê ta dilê te bixwaze, roj dirêjtir dibin.

Fanûsvên got: -ev derdê min derman nake. Tiştê ku ez di jiyana xwe da jê hez dikim, xew e, tenê dixwazim rakevim.

Şahzadeyê Qiçik got: hêf! ev rêya jî nebû.

Fanûsvên got: belê ku nebû. Rojbaş

Û fanûsa xwe xeva kir.

Dema ku Şahzadeyê Qiçik sefera xwe didomand di dilê xwe da got: tevî ku ev mirova tenha kes e ku ji bo xwe û dinyaya xwe ra kar nake lê dîsa jî pêkan e mirovên din weke padişêh, jixwerazî, serxweş û bazirgan henekên xwe bi wî bikin. Lê bi nêrîna min ew qet kenînbar nîne.

Û kesereke kûr ji dil da kişand û bi xwe ra got:

- Ev mirova tenê kes bû ku min dikarî bi wî ra bibime dost û heval. Lê hêf ku gerstêrka wî pir qiçik bû û cihê du kesan lê tune bû.

Tiştê ku Şahzadeyê Qiçik nediwêrî li xwe mukir were jî hesreta wê gerstêrka qiçik bû, bi taybetî ku li wir di her şevûrojekê da hezar û çarsed û çil caran roj diçû ava.

Şahzadeyê Qiçik 53

15

Şeşemîn gerstêrk deh caran berfirehtir ji gerstêrka pêncemîn bû. kalemêrek li wir hebû û wî pirtûkine stûr jî dinivîsîn.

Dema ku wî Şahzadeyê Qiçik dît bi dengekî bilind got:

- Beh beh! Ev jî dahênerek!

Şahzadeyê Qiçik li dêza masê rûnişt, ji ber ku rêyeke dirêj meşiyabû li nefesê dixist. Kalemêrî jê pirsî: -ji ku tê yî?

Şahzadeyê Qiçik got: - Ev pirtûka wisa estûr çi ye? Tu li vir çi dikî?

Kalemêrî got: - ez erdnigar im.

- Erdnigar yanê çi?

Şahzadeyê Qiçik 54

- Erdnigar, bi zaniyarên ku cihê derya, çem, bajar, çiya û deştan dizane ra tê gotin.

Şahzadeyê Qiçik got: - gelekî baş e. ev karekî girîng û sûdmend e. Û li hawirdora gerstêrka kalemêrê erdnigar nihêrî. Heta wê çaxê gerstêrkeke wisa mezin nedîtibû.

- Gerstêrka te pir bedew e. Panav jî lê hene?

Erdnigêr got: - ez çawa bizanim?

Şahzadeyê Qiçik got: - ecêb e! çiya çi?

Erdnigêr got: -çawa bizanim?

- Bajar, çem û deşt çi?

Erdnigêr got: - ji van tiştan jî bê xeber im.

- Axir tu çawa erdnigar î?

Erdnigêr got: - durist e lê ez ne dahêner im. Li cem min heta dahênerek jî tune. Karê erdnigaran ev nîne ku bi rê kevin û herin yek û yek hemû bajar, çem, çiya, derya, panav û deştan bihêjmirin. Paye û meqama erdnigaran bilindtir ji van tiştan e. Ew qet ji odeya xwe ya karê nayên der, dahêner diçin û lê dicivin, ew ji dahêneran pirsan dipirsin û ji bîranînên wan nîşe û notan dinivîsin. Û eger bîranînên dahêneran ji wan ra balkêş bin, wê demê erdnigar destûrê didin ku li ser reftar û kirdarê dahêneran, hin lêkolîn bên kirin.

- Ev kara ji bo çi ye?

- Ji ber ku eger dahênerek derewan bike yan pir meyê vexwe, dê karesat çê bibin.

Şahzadeyê Qiçik pirsî: -ez tênagihêjim çima?

Şahzadeyê Qiçik 55

- Ji ber ku mirov eger serxweş bibe, dema ku li tiştekî binêre ew vî tiştî dudiyan dibîne. Wê demê erdnigar li cihê ku tenê çiyayek heye, dinivîse du çiya hene.

Şahzadeyê Qiçik got: ez kesekî nas dikim ku ew ê bibe dahênerekî nebaş.

- Ev tişt pêkan e… bi her hal dema ku taybetmendiyên exlaqî yên dahênerekî baş bin, hin lêkolîn jî derbareyê kişfa wî tên kirin.

- Yanê diçin û ji nêzik va dibînin?

- Na. çûn û dîtina wan karekî zehmet e. ji dahêner tê xwestin ku hin belgeyan radest bike. Wek mînak eger mijara hatiye kişfkirin çiyayeke bilind be, ji wî tê xwestin ku hin kevirên gir ji wir bîne.

Erdnigar ji nişkê va hate ser hişa xwe û got:

- Baş e, tu jî ji rêyeke dûr va têyî! Pes tu jî dahêner î! Divê ku tu jî derbareyê gerstêrka xwe ji min ra şirove bikî.

Û Erdnigar defterk û pênûsek derxist û li benda Şahzadeyê Qiçik ma:

- Ez li benda te me, dest pê bike!

Şahzadeyê Qiçik got: - gerstêrka min pir balkêş nîne. Axir ew pir qiçik e. sê agirpij lê hene û dudu ji wan çalak in û yek jî neçalak e. lê mirov ku ji pêşeroja xwe tiştekî nizane.

Erdnigêr jî got: -mirov nizane di pêşerojê da çi dibe.

- Guleke min jî heye.

Şahzadeyê Qiçik 56

- Na, na, êdî karê me bi gulan neketiye.

- Çima? Gul ku pir ciwan in.

- Ji ber ku gul gerguhêz in.

- Gerguhêz yanê çi?

Erdnigêr got: - pirtûkên erdnigariyê ji pirtûkên din giranbihatir in û qet jî ji hêjatiya wan kêm nabe. Tu caran şûna çiyayekê nayê guhertin. Tu wextê panavek ji avê vala nabe. Em tenê tiştên negerguhêz û payedar dinivîsin.

Şahzadeyê Qiçik gotina wî birî û got: - lê agirpij dibe ku xeva herin û ji nû va vebijîn. Te negot gerguhêz yanê çi?

Erdnigêr got: - agirpij çi vêketî û çi xevaçûyî ji me ra ferq nakin. Tiştê ku ji me ra girîng e tenê çiya ye ku ew tu caran naguhere.

Şahzadeyê Qiçik ku qet ji pirsên xwe dest hilnatanî, dîsa pirsa xwe dubare kir û got: - gerguhêz yanê çi?

- Yanê tiştên ku zû ji holê rabin û ji nav herin.

- Gula min jî di pêşerojê da ji nav diçe?

- Helbet ku ji nav diçe.

Şahzadeyê Qiçik di dilê xwe da got: "gula min gerguhêz e û yê wê ji bilî çar striyan ji bo bergirîkirin ji xwe li hemberî dinyayê êdî tiştekî xwe ya din tune. Tu min bibêj ku min ew tek û tenê li gerstêrka xwe berdaye û avêtiye!" yekemîn car bû ku ew xemgîn û perîşan dibû lê dîsa jî xwe kontrol kir.

Wî pirsî: - tu dîtina kîjan gerstêrkê ji min ra pêşniyaz dikî?

Erdnigêr lê vegerand: - gerstêrka erdê. Binavûdeng e…

Û Şahzadeyê Qiçik ku li gula xwe difikirî, bi rê ket û çû.

Şahzadeyê Qiçik 57

16

Gerstêrka erdê bû heftemîn cihê ku wî sewa geriyanê hilbijart. Erd gerstêrkeke nenas nîne. Li wir sed û yanzdeh padişah (helbet padişahên çermreşan jî neyên ji bîr kirin), heft hezar erdnigar, nehsed hezar karsaz û heft û nîv milyon serxweş û yanzdeh milyon jixwerazî ku bi giştî nêzikî du bilyon "mirovên mezin" hene.

Ji ber ku ez pîvanekî ji endaza erdê bidim we, wek mînak berî ku ceryan were kişfkirin, li her şeş parzemînan leşkereke pêkhatî ji çarsed û şêst û du hezar û pêncsed fanûsvanan hebû. Dîtina vê dîmenê ji dûr va bandoreke xwe ya balkêş hebû. Tevgera wê leşkerê wek tevgera lîstikvanên oprayê rêkûpêk bû. Di serî da dora fanûsvanên Zêlanda Nû û Australiyayê bû. Wan ku fanûsên xwe vêdixistin û diçûn radiketin, piştre dor û nobeta fanûsvanên Çîn û Sîbriyê bû ku bên û bilîzin. Ew jî diçûn û xwe vedişartin ji dû ra fanûsvanên Rûsiya û Hindê dihatin. Piştre

fanûsvanên Amrîkaya başûrî û ji dû ra fanûsvanên Amrîkaya bakûrî dihatin dîtin. Û nema rêz û tertîba wan li hev diket. Çiqas dîmeneke rewneqdar çê dibû. Di nava wê leşkera mezin a fanûsvanan da tenê du fanûsvan hebûn ku temena wan hinekî bêmifa derbas dibû, ew jî fanûsvanên cemsera bakûr û cemsera başûr bûn. Wan di salekê da tenê du caran kar dikir.

17

Mirovên ku dixwazin xwe jîr bidin nîşandan, pirî caran derewan jî dikin. ez di şirovekirina fanûsvanên erdê da rastgo nebûm. Ez ji vê yekê ditirsim ku şiroveyên min derbareyê erdê ji hinekan ra dîmenekî şaş biafirîne. Mirovên ser erdê şûnekî pir qiçik

Şahzadeyê Qiçik 58

dagirtine. Eger du bilyon mirovên ser erdê li hev bicivin û komî ser hev bibin, bi hêsanî li meydaneke çargoşe bi dirêjtiya bîst mayl û panatiya bîst maylan cih digirin. Yanê em dikarin civaka mirovahiyê li "panava Aramê" bi cih bikin. Mirovên salmezin dê teqez gotina we bawer nakin. Ew wisa difikirin ku wan cihekî pir dagirtine û ew xwe bi qasî darên Baûbabê mezin dibînin. Pes hûn ji wan bixwazin ku ew hisab bikin. Ew ku ji hejmar û reqeman pir hez dikin. lê hûn wexta xwe li ser van tiştên pûç telef mekin, çûnku ew karekî bêmifa ye. Baweriya we bi min heye.

Belê, dema ku Şahzadeyê Qiçik gihîşte ser gerstêrka zemînê, wî tu kes nedît, mat û heyran ma!

Şahzadeyê Qiçik 59

Wisa difikirî ku navnîşana hatiye şaş be, ji nişkê va gurîfek bi rengê hîvê li nav qûmê livî. Şahzadeyê Qiçik bêhemdî xwe got: şevbaş!

Marê got: şevbaş

Şahzadeyê Qiçik pirsî: ez li ku me, ez li ser kîjan gerstêrkê daketime?

Marê got: tu li ser erdê yî û vira jî xakê Afrêqayê ye.

- Ohh!... pes li ser erdê tu kes tune?

Marê got: vira sehra ye û li sehrayê tu kes peyda nabe. Zemîn pir berfireh e.

Şahzadeyê Qiçik li ser kevirekê rûnişt, berê xwe da asmîn û got:

Şahzadeyê Qiçik 60

- Ez wisa difikirm, stêrk ji ber vê yekê diçirûskin ku her kes bikaribe stêrka xwe li asmên peyda bike. Li gerstêrka min binêre, ew li ser serê me ye lê pir ji me dûr e!

Marê got: - bedew e. ji bo çi hatî vir?

Şahzadeyê Qiçik got: - ji ber ku min û gulekê bi hev ra hinekî kire xirecir.

Marê got: - ecêb e!

Û her du jî xef û bêdeng man.

Di dawiyê da Şahzadeyê Qiçik got: - mirov li ku ne? Ez li sehrayê hinekî xerîbiyê dikim.

Marê got: - li cem mirovan jî tu yê wisa his bikî.

Şahzadeyê Qiçik demeke dirêj bi baldarî li wê nihêrî û lê xire bû û piştre got: - tu çi candareke xwînşêrîn î! Zirav î weke tiliyekê.

Marê got: lê ji tiliya her padişahî bihêztir im.

Şahzadeyê Qiçik bişirî û. got:

- Tu pir jî ne bihêz î…ling û penceyên te jî tune ne. tu heta nikarî biçî seferê jî…

- Ez dikarim te bibime cihên wisa dûr ku kiştî jî nikarin te bibin.

Marê ew gotina xwe got û li dora gwîzika lingê Şahzadeyê Qiçik şiriya. Weke zincîreke zêrîn.

- Ez bi her kesî bigirim ew ê vegere xaka jê hatiye çêkirin! Lê tu mirovekî pak û dilsafî û ji gerstêrkeke din hatî…

Şahzadeyê Qiçik bersivek neda wê.

Şahzadeyê Qiçik 61

- Tu li vir bê bergirî, jar û hejar î. Dilê min ji te ra dişewite. Eger rojekê te bêriya gerstêrka xwe kir, were ez alîkariya te bikim… ez dikarim…

Şahzadeyê Qiçik got: - erê min heta dawiyê fam kir. Lê tu çima hemû gotinên xwe weke nepenî û tiştanokan dibêjî?

Marê got: ez hemû raz û nepeniyan dizanim û dikarim wan ronî bikim.

Ew her du jî bêdeng man.

18

Şahzadeyê Qiçik li kevîrê bi giştî geriya û ji bilî gulekê tu tişt nedît: guleke qiçik û sê belgî.

Şahzadeyê Qiçik got: silav.

Gulê got: silav

Şahzadeyê Qiçik bi rêz û hurmet jê pirsî: mirov li ku ne?

Şahzadeyê Qiçik 62

Gulê berî niha carekê karwanek dîtibû, got: - mirov? Bi gumana min tiştê ku tu dibêjî tenê pênc şeşek ji wan hene. Çendîn salan berê niha min ew dîtin. lê cihê wan nediyar e. şemal wan bi xwe ra vir da wir da dibe. Ji ber ku ew bê kok û bê cile ne. bêkokbûn jî ji wan ra dibe serêş.

Şahzadeyê Qiçik got: - bi xatirê te.

Gulê got: - oxirê be.

19

Hilkişiya ser çiyayeke bilind.

Di hemû jiyana xwe da ji bilî sê çiyayên agirpijî, çiyayeke din nedîtibû. Ew jî pir qiçik bûn û bilindiya wan bi qasî joniya wî jî nedibûn lê yek ji wan ku neçalak bû; Wî agirpijê neçalak weke kursî bi kar tanî û li ser wê rûdinişt. Loma jî bi xwe ra got: "ji

Şahzadeyê Qiçik 63

ser çiyayeke wisa bilind ez dikarim bi awirekê hemû gerstêrk û mirovan bibînim…" lê ji bilî çinga çiyayan tiştekî din nedît.

Dengê xwe berda û got: - silav.

Deng li nav çiyayan pêçiya û lê vegeriya: - silav… silav… silav…

Şahzadeyê Qiçik got: - tu kî yî?

Dengê wî lê vegeriya: -tu kî yî… tu kî yî… tu kî yî…

Got: - ez bi tenê me, bi min ra bibe heval.

Deng lê vegeriya: - ez bi tenê me… ez bi tenê me… ez bi tenê me…

Wê demê bi dest xwe da ma: "çi gerstêrkeke ecêb e! Parçeyek hişk, toj û şor e. mirovên vir qet şiyana xwe ya afrêndêriyê tune ne û her tiştî ku bibêzin heman tiştî dubare dikin… di gerstêrka min da guleke min hebû ku hertim gep, gepa wê bû yanê bi ser gotina wê ra gotineke din tune bû…"

20

Piştî meşeke dûdirêj di nav qûm û zinaran û berfê ra gihîşte rêyekê. Û diyar bû ku ew riya jî bi destê mirovan hatiye avakirin.

Ew gihîşte bistaneke tijî gulên swîr, got: - silav

Şahzadeyê Qiçik 64

Gulan bersiv dan: -silav

Şahzadeyê Qiçik li wan nihêrî. Ew gulana hemû li gula wî dişibiyan. Mat û heyirî pirsî: - hûn kî ne?

Gotin: - em gulên swîr in.

Hesreteke kûr kişand û his dikir ku pir bedbext e. gula wî gotibû ku di hemû dinyayan da bêhempa ye û weke wê, gul peyda nabin. Lê niha wî pênc hezar gul, hemû jî weke wê di bustanekê da dîtin.

Bi xwe ra got: "eger gula min ev dîmena bidîta wê yê pir fedî bikira. Li pey hev dikuxiya û ji ber ku kesek henekê xwe bi wê ra neke, wê yê xwe li mirinê xistina û wê demê ez jî mecbûr dimam wisa binimînim ku ez perestariya wê dikim. Eger na ew ji ber ku heqaretan bi min bike, bi rastî jî dimir…" û dîsa di dilê xwe da got: "tu li min binêre ku min bi xwedîbûna gulekê, xwe dewlemendê dinyayê dihesiband û ew jî li halekê ku gula min

jî tenê guleka asayî bû. Bi gulekê û sê agirpijan ez Şahzade nedihatim hesêb. Bilindiya agirpijan bi qasî joniyên min jî

Şahzadeyê Qiçik 65

nedibû û yek ji wan jî ku neçalak bû û belkî heta hetayê jî xeva bimana. Wî xwe li ser giyayê dirêj kir û giriya.

21

Di wê demê da roviyek xwe nêzikî wî kir.

Rovî got: - silav!

Şahzadeyê Qiçik serê xwe tavda, kesek nedît lê birêz û hurmet bersiva silavê da.

Dengê got: -ez li vir im. Li bin dara sêvê…

Şahzadeyê Qiçik pirsî: -tu kî yî? Tu çiqas bedew î! ...

Rovî got: -ez rovî me.

Şahzadeyê Qiçik 66

Şahzadeyê Qiçik ji wî xwest ku ew were bi hev ra bilîzin, ez ewqas xemgîn im ku nayê gotin…

Rovî got: - ez nikarim bi te ra bilîzim. Ez hîn nehatime kedîkirin.

Şahzadeyê qiçik bi hesret got: bibore!

Piştî ku hinekî fikirî got:

- "Kedîkirin" yanê çi?

Rovî got: - tu ne ji vir î. Li pey çi digerî?

Şahzadeyê Qiçik got: - ez li dû mirovan digerim. "kedîkirin" yanê çi?

Rovî got: - mirovan tifingên xwe hene û ew nêçîrê dikin. Ev karê wan dilşikên e. lê mirîşkan jî diperwerînin û tenê sûd û faydeya wan jî ev e. Tu li pey mirîşkan digerî?

Şahzadeyê Qiçik 67

Şahzadeyê Qiçik got: - na, ez li pey hevalan digerim. Te negot "kedîkirin" yanê çi?

Rovî got: - "kedîkirin" tiştek e ku niha hatiye jibîrbûn. Yanê "çêkirina têkilî û elaqeyê…"

- çêkirina elaqe û têkiliyê?

Rovî got: - helbet tu hîn ji min ra zarokek î weke hezaran zarokên din. Û qet niyaza min bi te tune. Lê niyaza te jî bi min tune. Ez jî ji te ra roviyek im weke hezaran roviyên din. Lê eger tu min kedî bikî, wê demê dê niyaza me bi hevdu hebe. Di hemû dinyayê da ez ji te ra dibim tiştekî bêhempa û yegane û tu jî ji min ra dibî yegane û bêguher…

Şahzadeyê Qiçik got: - hêdî hêdî tê digihêm… gulek heye… bi gumana min wê ez kedî kirime.

Rovî got: - Ev yeka jî mumkin e. li ser gerstêrka zemînê gelek tişt tên dîtin…

Şahzadeyê Qiçik hesreteke kûr kişand û got: - Ev ê ku ez dibêjim ne li ser zemînê ye.

Rovî gelekî hêvî kir ku bizanibe ew qala çi dike:

- Gelo di gerstêrkeke din da ye?

- Belê.

- Li wê gerstêrkê jî nêçîrvan hene?

- Na.

- Çi rind!..Mirîşk çi, hene?

- Na.

Şahzadeyê Qiçik 68

Rovî hesretek ji dil da kişand û got: - hêf ku tu tişt kamil û bê êyb nîne!

Rovî li fikirîna xwe ya berê vegeriya û got:

- Jiyana min yeksan e. ez mirîşkan nêçîr dikim û mirov jî min nêçîr dikin. Mirîşk hemû dişibin hev û mirov jî hemû yeksan in. loma dema min li vir bi bêhalî derbas dibe. Lê eger tu min kedî bikî, ez weke rojê vêdikevim. Ez bi dengê lingên kesekî ra nasyar dibim ku dengê lingên wî li gel dengê lingê kesên din ferq dike. Dengê lingên kesên nenas min ber bi kunan va

direvînin lê dengê lingên te weke awaza mûzîkê min ji kunê derdixe. Dûre jî tu li genimzarê binêre. Ez nên naxwim û ji min tirê genim tiştekî bêbiha ye. Mixabin dema ku ez genimzaran dibînim, bi bîra tu tiştî nakevim. Lêbelê porê te zêrîn e. eger tu min kedî bikî, wê demê eger ez li gênim binêrim ez ê bikevime bîra te. Yanê rengê zêrîn ê gênim min ê bi bîra te bêxe. Hingê ez ê ji dengê wezîna bayê di nav gênim ra jî, hez bikim…

Rovî xef û bêdeng, demekê li Şahzadeyê Qiçik nihêrî. Di dawiyê da got:

Şahzadeyê Qiçik 69

- Ji kerema xwe tu min kedî bike!

Şahzadeyê Qiçik lê vegerand: - pir dilê min dixwaze te kedî bikim lê dema min tune. Gerek ez biçim û çend hevalan ji xwe ra peyda bikim û gelek tişt hene divê ez wan nas bikim.

Rovî got: - heta ku tiştek neyê kedîkirin qet neyê naskirin jî. Niha dema mirovan pir tuneye bikaribin her tiştî nas bikin. Ew tiştên hatine avakirin û çêkirin jî, ji dûkanan dikirin lê ji ber ku dûkanên hevalfiroşiyê tunene, niha mirov bê dost û heval mane. Lê eger tu hevalekê bixwazî divê min kedî bikî!

Şahzadeyê Qiçik pirsî: - sewa kedîkirina te ez gerek çi bikim?

Rovî lê vegerand: - divê sebr û taqeta te pir be. Di destpêkê da divê tu biçî nava van giyayan û xwe veşêrî. Ez di bin çavên xwe ra li te dinêrim û tu jî qet tiştekî nabêjî. Ziman, jêder û bingeha pirsgirêkan e! lê her roj tu hinekî bi pêş va têyî.

Sibetirê dîsa Şahzadeyê Qiçik hat.

Rovî got:

- Baştir bû ku tu di dema duh da bihatayî. Wek mînak eger tu her roj di saet çar ê piştî nîvro da werî, ez ji saet sêyan da hêdî hêdî kêfxweş dibim û bi derbasbûna demê ra hêdî hêdî kêfxweşiya min dê zêdetir bibe. Û di saet çaran da kelecan min digire û hinekî nigeran dibim wê demê ez qedr û qîmeta xweşbextiyê dizanim. Lê eger tu di demeke nediyar da werî dilê

min ê hewesdar nizane kengî ji bo pêşwazîkirina te ra xwe bixemilîne… axir di her karekî da gerek resm û rêbazek hebe.

Şahzadeyê Qiçik 70

Şahzadeyê Qiçik pirsî : "resm û rêbaz" yanê çi?

Rovî got: - ev jî tiştek e ku niha hatiye jibîrbûn. Ev heman tişt e ku dibe sebaba ferqkirina di navber roj li gel rojan û saet li gel saetan. Weke mînak nêçîrvanên gund rêbazeke xwe hene; di rojên pêncşemê da diçin û bi keçikên gund va direqsin. Pes roja pêncşemê ji min ra pîroz e. di wê rojê da ez ji xwe ra azad digerim û her derê ku dilê min dixwaze diçim. Eger gişt rojan

Şahzadeyê Qiçik 71

nêçîrvan biçûna dîlanê, hemû rojên min li hev dişibiyan û ji min ra dema bêhnvedanê nedima.

Wisan bû ku Şahzadeyê Qiçik rovî kedî kir. Lê dema cudabûnê û xatirxwestinê ku hat, rovî got:

- Ax ku ez ê hêstiran birêjim.

Şahzadeyê Qiçik got: - ev ne sûcê min e. min ku nedixwest azarê bigihînime te. Te bi xwe xwest ku ez te kedî bikim…

Rovî got: durist e.

Şahzadeyê Qiçik got: - pes bi her hal tu yê bigirî?

Rovî got: - helbet belê.

Şahzadeyê Qiçik got: - lê girî jî ji te ra bêfeyde ye.

Rovî got: - niha ez li rengê genimzaran binêrim û bigirîm...

Piştre got: - biçe careke din li wan gulan binêre ta têbigihêjî ku gula te di hemû dinayê da tek û yegane ye. Û ji dû ra vegere cem min ji bo xatirxwestinê, wê demê ez ê raz û nepeniyekê ji te ra eşkere bikim.

Şahzadeyê Qiçik careke din çû û li gulan nihêrî û bi wan ra got: - hûn bi qasî serê derziyekê jî naşibine gula min. ne hûn ji aliyê kesekî va hatine kedîkirinê û ne jî we kesek kedî kiriye. Hûn durist weke roviya min in

dema min ew di roja ewilê da dît. wê çaxê ew jî roviyek bû weke hezaran rovî yên din. Lê min ew ji xwe ra kire heval û nika ew jî di dinyayê da yegane û bêhempa ye.

Û dilê gulên swîr şikest.

Şahzadeyê Qiçik 72

Şahzadeyê Qiçik dîsa got: - hûn pir ciwan in lê hûn ji hundir da vala ne. sewa we ra kesek xwe nade kuştin. Helbet li gorî dîtina rêwiyekî gula min jî pir dişibe we lêbelê ew bi tena serê xwe ji we hemiyan hêjatir e. Ji ber ku tenê min ew av daye. Min ew di bin kulavê da ji ba û bahozê parastiye. Min bihukên li dorbera wê kuştin û tenê du-sêkek ji wan zindî hiştin ku ew jî dibûn minminîk. Ji ber ku tenê ez bûm ku min li gilegaziyên wê, xwepesndana wê û pirî caran jî li bêdengmana wê guhdarî kiriye. Çûnku ew gula min a swîr e.

Hingê vegeriya cem rovî û got:

- Bi xatirê te!..

Rovî got: - oxir be lê niha bisekin ku ez raz û nepeniya min qala wê ji tera kiribû, eşkere bikim. Ew pir sade û asayî ye. Bizan, mirov tenê bi çavên dilê xwe dikarin vî tiştî bibîne. Tiştê esl û resen ji bînahiyan veşartî ye.

Şahzadeyê qiçik ji ber vê hevokê ji bîr neke, dubare kir:

- Tiştê esl û resen ji dîtinan veşartî ye.

- Dem û emra xwe ya ku li gel gula xwe derbas dikî, nirx û qîmetê dide wê.

Şahzadeyê Qiçik ji ber vê hevokê ji bîr neke, ev jî dubare kir:

- Dem û emra xwe ya ku tu ligel gula xwe derbas dikî, nirx û qîmetê dide wê.

Rovî got: mirov ev rastiya ji bîr kiriye lê divê tu ji bîr nekî. Tu her tiştî kedî bikî dibî berpirsyarê vî tiştî. Tu niha berpirsyarê gula xwe yî.

Şahzadeyê Qiçik ji ber ku vê hevokê ji bîr neke, dubare kir:

Şahzadeyê Qiçik 73

- Ez berbirsyarê gula xwe me…

22

Şahzadeyê Qiçik got: - silav

Guhêrkarê rêhesinê got: - silav

Şahzadeyê Qiçik pirsî: - tu li vir çi karî dikî?

Guhêrkarî got: - ez rêwiyan deste deste (ref ref) dikim û wan li trenê siwar dikim û her desteyekê rû li aliyekî dişînim, carinan rû li aliyê çepê, carinan rû li aliyê rastê wan dişînim. Di heman demê da tevgera treneke lezgîn a çira vêketî weke birûskê digurmijî, odeya guhêrkarî lerizand.

Şahzadeyê Qiçik got: -ev pir bilez in. ew li pey çi ne?

Guhêrkarê rêhesinê got: - ajokarê trenê bi xwe jî nizane.

Û dîsa treneke din a lezgîn û çiravêketî berevajî derbas bû.

Şahzadeyê Qiçik got: - ew çi zû vegeriya?..

Guhêrkar got: - Ew nîne ku, ew treneke din bû ji cihekî din va dihat.

- Meger ew ji cihê lê bûn razî nebûn?

Guhêrkarî got: - mirov hertim ji cihê ku lê ye nerazî ye.

Treneke din a lezgîn û çiravêketî, gurmijî û derbas bû.

Şahzadeyê Qiçik got: - ew rêwiyên ewilê dişopînin?

Guhêrkar got: - Ew tu tiştî naşopînin. Ew di trenê da yan radikevin yan jî dibawişkin. Tenê zarok in ku bêvila xwe bi camê trenê va dinûsikînin.

Şahzadeyê Qiçik 74

Şahzadeyê Qiçik got: - tenê zarok dizanin ji dinyayê çi tiştî dixwazin! Ji xwe ra bi paçikekê bûkeke qiçik çê dikin pê dilîzin û eger ew pêlîstoka ji wan were standin, ew ê bigirîn…

23

Şahzadeyê Qiçik got: - silav

Dûkandar got: - silav

Vî dûkandarî heb difirotin, hebên berteref kirina tînîtiyê. Kesên ku di nava hefteyekê da hebekê bixin ew ê heta dawiya hefteyê tî nebin.

Şahzadeyê Qiçik pirsî: - tu çima van heban difiroşî?

Dûkandar got: -ji ber ku dema me neyê telefkirin. Karzanan hisab kirine ku bi xwarina hebekê, mirov dikare di nava hefteyekê da pênçî û sê deqeyan ji wexta xwe ragire.

- Baş e, hingê wan pêncî û sê deqan çawa derbas bike?

- Her karê dilê mirov bixwaze, dikare bike.

Şahzadeyê Qiçik 75

Şahzadeyê Qiçik bi xwe ra got: "eger pêncî û sê deqeyan dema min hebûya, min xwe li ba bikira û hêdî hêdî biçûma ser kaniyê..."

24

Ji xerabiya balafira min li çolê heşt roj derbas bûn. Min bi guhdarîkirin li çîroka hebfiroşê, dilopa herî dawîn a avê jî vexwar. Min bi keservedanekê bi Şahzadeyê Qiçik ra got: - bîranînên te gelekî xweşk in, lê efsûs ku min hîn balafira xwe temîr nekiriye û ava vexwainê jî ji min ra nemaye. Û xwezî min jî bikariba xwe li ba bikira û hêdî hêdî ber bi kaniyê va biçûma.

Wî bi min ra got: - roviya hevala min...

Min got: - dev ji wê berde pepûka min! ez qala rovî nakim.

- Çima?

- Ji ber ku em ê ji tîbûnê bimirin.

Wî ji gotina min fam nekir û li min vegerand:

- Çiqas rind e ku mirov heta dema mirinê jî ji bîr neke ku hevalên wî hene. Ez pir kêfxweş im ku hevaleke min a weke rovî heye...

Min di dilê xwe da got: - ev mirovê qiçik, xetera ku li kemîna me ye fam nake. Ew nema tîbûn û birçîbûnê dikişîne. Ew ê bi ronahiya rojê jiyana xwe derbas bike...

Lê ew li min xire bû û bersiva fikirîna min da:

- Ez jî tî me… were em li bîreke avê bigerin…

Min bi awayekî westiyayî xwe livand û ji cihê xwe rabûm, karekî pir bêencam e ku li çoleke berfireh û bê dêbav li bîreke

Şahzadeyê Qiçik 76

nediyar bigerî! Lê dîsa jî em lê geriyan. Em çendîn saetan xef û bêdeng li bîrê digeriyan lê êvar bi ser me da daket û stêrk li asmên diçirûskîn. Ewqas ez ji tîbûnê hêrijîbûm ku ji min tirê ez wan stêrkan di xewn û xeyalên xwe da dibînim. Gep û gotinên Şahzadeyê Qiçik di mêjiyê min da dilîstin.

Min ji wî pirsî: - pes tu jî tî yî?

Lê wî pirsa min nebersivand, tenê got:

- Dibe ku av ji bo dil jî rind be…

Min ji gotina wî tiştek fam nekir û ez bêdeng mam… min baş zanîbû divê tiştekî jê nepirsim.

Ew westiya bû û rûnişt. Ez jî li kêlekê wî rûniştim. Piştî bêdengiyekê dîsa got:

Bedewiya stêrkan ji ber gulên nediyar e.

Min di bersivê da got: "helbet belê!" û bêyî tiştekî din bibêjim, min li pestî û bilindiyên erdê ku li bin ronahiya hîveronê baş dihatin dîtin, nihêrî.

Wî dîsa got: - Sehra bedew e.

Û rast jî digot. Min tim ji sehrayan hez dikir. Mirov dikare li ser gireke ji qûmê rûne, tiştekî nebîne û nebihîze. Û di wê rewşa bêdengiyê da tiştek jî diçirûske…

Şahzadeyê Qiçik got: - tiştê ku sehrayê bedew dike, bîra avê ye ku di guçeke wê da xwe veşartiye…

Ji ber ku min nepeniya çirûskîna razbar a qûmê fam kiribû, ez matmayî ma bûm. Dema ez hîn zarok bûm, em di xaniyekî kevn da rûdiniştin, gotegoteke wisa jî hebû ku digotin li wir gencek

Şahzadeyê Qiçik 77

veşartî heye. Helbet qet ew genca nehate peydakirin lê kesek jî lê nedigeriya ku bixwaze wê peyda bike. Lêbelê gotegota hebûna wê gencê şêniyên malê tim kêfxweş kiribûn. Mala min raz û nepeniyek di dilê xwe da veşartibû.

Min bi Şahzadeyê Qiçik ra got: erê, ferq nake mal be yan stêrk yan jî sehra. Tiştê ku wan bedew dike nayê çav!

Wî got: - ez kêfxweş im ku nêrîna te û rovîya min yeksan e. ji ber ku Şahzadeyê Qiçik ketibû xewê min ew hemêz kir û riya xwe domand. Dest û dilê min dilerziyan. Mîna tiştekî pir giranbuha di destê min da be. Yanê ji min tirê tiştê herî şikestinî yê dinyayê di destê min da ye. Min li bin hîveronê li van çavên girtî û li porê wî yê zêrîn ku bi wezîna bayê ra dilivî nihêrî û bi xwe ra got: "tiştê ez dibînim tenê zahir û ruxsar e lê tiştê esl û resen veşartiye û nayê dîtin…"

Bişirîneke şêrîn jî li ser lêvên Şahzadeyê Qiçik kon vegirtibû, min bi xwe ra got: "tiştê ku gelekî li ser min bandorê datîne, pabendî û wefadariya wî sewa gulekê ra ye. Û ew dîmen a heman gulê ye ku heta di xewê da jî di canê wî da weke elawê êgir vediberiqe…" di wê demê da ez wisa fikirîm ku ew bi rahetî tê azargihandinê. Divê haya mirov ji çirayan hebe çûnku ew bi bayeke qiçik jî tên xevakirin…

Û wisan ku di rê da diçûm û berê hewayê gewr kiribû, min bîrek peyda kir.

25

Şahzadeyê Qiçik got: - mirov!...xwe diawînin nava trenên lezgîn û bi xwe jî nizanin li pey çi tiştî ne. loma jî ew tim li dora xwe digerin.

Şahzadeyê Qiçik 78

Û piştre got: - ev çi kar e …

Bîra ku me peyda kiribû ne weke bîrên sehrayan bû. Bîrên sehrayan weke çalekî sade di nava qûmê da ne. ev bîra weke bîrên gundan bû. Lê li vî nêzikî ku gund tunebûn. Min fikir dikir ku xewnan dibînim.

Min bi Şahzadeyê Qiçik ra got: - ecêb e. her tişt amade ye. Çerx, dewl û werîs…

Şahzadeyê Qiçik kenî û destê xwe dirêjî wêrîs kir. Werîs girt û çerx zivirand.

Şahzadeyê Qiçik 79

Û çerx wekî bapîvê ku demekê piştî rawestana bayê jî hîn dizivire û dinale, ew jî dinaliya.

Şahzadeyê Qiçik got: - dibîzî? Me bîr ji xewê rakir, ew ji me ra distirê.

Min ku nedixwest ew xwe biwestîne:

- Bisekin, ez çerxê bizivirînim. Ev kara ji te ra zor e.

Min dewl hêdî hêdî kire devê bîrê û ew hinekî ragirt ta ji livînê da bikeve, ta dema diçe binê bîrê li dîwaran nekeve. Dengê awaza çerxê di guhê min da bû. Ez westiyayî lê şad bûm. Min di nav avê da wêneya rojê ku dilivî jî didît.

Şahzadeyê Qiçik got: - qulmek av bide min ez pir tî me.

Ez nû têgihîştim ew li çi digere.

Min dewl bire ber devê wî. Bi çavên girtî dewl kişande serê xwe û av vexwar. Aveke pir şêrîn bû. Çêşa wê avê li gel çêşa her cûre xwarin û vexwarinên din ferq dikir. Avek bû ku ji zehmeta bask û pîlên min, awaza çerxê û şevgera min li bin ronahiya stêrkan hasil bûbû. Ew mizgînek bû ji bo dil ra. Weke dema zaroktiya min, çiriya dara kirîsmesê û mûzîka nîvê şeva eyedê û bişirînên di wê demê da li me dihatin xelatkirin.

Şahzadeyê Qiçik got: - mirovên gerstêrka te pênc hezar gulên swîr ji bustanekê diçînin û di nav wan da jî nikarin gula xwe peyda bikin…

Min lê vegerand: - "belê nikarin peyda bikin."

Şahzadeyê Qiçik 80

Û bi van şiroveyan, hemû tiştên ku ew lê digerin di qulmek av yan guleke swîr da jî tên peydakirin.

Min jî got: -"erê, rast e."

Şahzadeyê Qiçik got: - helbet ev tişt bi çavan nayên dîtin, gerek bi çavên dil li wan bigerin.

Min av vexwaribû. Min bi rahetî nefes dikişand. Di dema rojhilatinê da qûm weke hingivê tê xuyakirin. Min ji wî rengî jî pir hez dikir. Yanê tiştekî ku min birencîne tune bû…

Şahzadeyê Qiçik li kêlekê min rûniştibû bi dengekî nizm got:

- te sozek dabû min, tê bîra te? Tu gerek soza xwe bi cih bînî.

- Soza çi?

- Tu bi xwe dizanî… sewa berxa min ra pozbendekê jî bikişîn. Axir ez berpirsyarê wê gulê me.

Min hin planên ku kişandibûn ji bêrîka xwe derxistin, Şahzadeyê Qiçik li wan nihêrî û bi ken got:

- Dara te ya Baûbabê weke keleman e…

- Ohh! Li min binêre min çiqas şanazî bi plana xwe ya dara Baûbabê dikir!

- Plana roviya te… guhên wê zêdetir dişibine şaxan… te pir dirêj kişandine…

Û dîsa kenî.

Mala te ava be! tu dizanî min ji bilî nigara marên bûa tiştekî din nekişandiye.

Şahzadeyê Qiçik 81

Got: - ah, tişt nake… zarok tênagihêjin. Min bi pênûsê pozbendek jî li nigara berxê zêde kir û da destê wî lê dilê min tijî bû:

- Hin planên te hene ez ji wan bê xeber im…

Lê wî bersiva min neda, tenê got:

- Tu dizanî sibe, salek ji hatina min a ser zemînê, derbas dibe…

Û dîsa piştî kêliyekê bêdengî, got:

Ez li van derûdoran ketibûm…

Û rengê rûyê wî swîr bû.

Û dûra bêyî hemdî xwe ez kelogirî bûm, li vê halê min jê pirsî:

- Pes ji ber vê yekê heşt rojan berî niha ku min tu dîtî, tu bi hezaran maylan dûr ji gund û waran digeriyayî. Pes tu ber bi şûna daketina xwe va dihatî?

Dîsa rûyê Şahzadeyê Qiçik swîr bû.

Û min bi dudilî lê zêde kir:

- Neke tu ji bo cejna yekemîn salvegera daketina xwe dihatî vir?...

Şahzadeyê Qiçik dîsa swîr bû. Wî tu caran bersiva pirsan nedida. Lê dema ku pirsek ji kesekî tê pirsîn û ew swîr dibe yanê bersiva pirsê erênî ye. Meger na?

Min bi wî ra got: -" wey, ez ditirsim…"

Lê wî li min vegerand:

Şahzadeyê Qiçik 82

- Divê tu niha vegerî cem balafira xwe û karê xwe bikî. Ez li vir li benda te me. Sibe danê êvarê veger…

Ez erxîn nebûm. Ketime bîra gotina rovî. Eger mirov hatibe kedîkirin, gerek xwe sewa girî û hêstirrijandinê ra jî amade bike…

26

Li kêlekê bîra avê dîwarekî kevn hebû. Dema ku sibetirê ji ser karê xwe vegeriyam, min ji dûr va Şahzadeyê Qiçik dît li ser dîwêr rûniştibû û lingên xwe jî delengaz kirbûn. Min bihîst ew diaxive, digot:

- Pes nayê bîra te? Nizanim durist li vir bû yan na!

Bê şik dengekî din bersiva wî dida, çûnku Şahzadeyê Qiçik dîsa got:

Şahzadeyê Qiçik 83

Çima, çima. Roj heman roj e. lê şûna ku ez daketim ne li vir bû…

Min riya xwe ya diçû ber dîwêr, domand. Lê min ne kesek dît ne jî min dengek bihîst. Lê Şahzadeyê Qiçik dîsa got:

- Helbet. Ka binêre şopa lingê min ji ku derê va dest pê kiriye. Li wir li benda min bisekin. Îşev ez ê werim wir.

Ez gihîştibûm bîst metriya dîwêr, lê dîsa jî min tiştek nedidît. Şahzadeyê Qiçik piştî kêliyek bêdengî got:

- Jehra te bihêz e? Naxwazim pir êş û janê bihemilînim.

Ez bi dilekî bidarda sekinîbûm lê dîsa jî min tiştek fam nedikir. Wî got:

- Niha tu here. Ez dixwazim dakevime jêr!

Wê demê min bi baldarî li ber dîwêr nihêrî û ez veceniqîm. Li wir mareke reş û hov li ber Şahzadeyê Qiçik serê xwe rakiribû, ev ji van cûre maran bû ku dikarin di nava sîh saniyeyan da mirovekî bişnîne dinyayeke din. Ez bi lez û bez ber bi wan va meşiyam û min destê xwe kiribû bêrîka xwe û li demançeya xwe digeriyam. Lê marê bi bihîstina dengê lingê min ra revî û xwe li nav keviran veşart.

Ez di demeke baş da gihîştime wir. Şahzadeyê Qiçik mîna xweliya gewr sîs bûbû. Min ew hemêz kir:

- Ev çi hal e! Nika tu bi maran ra jî gep dikî!

Min ustipêça wî ya zer ku hertim li dora ustûyê wî bû, ve kir. Min hinek av li rûyê wî kir û qulmek jî bi wî da vexwarin. Êdî min nediwêrî tiştekî jê bipirsim. Ew li min nihêrî û ustûyê min li

hemêz kir. Min gursîna dilê wî weke dilê balendeyeke gulelêketî ku dixwaze bemire, his dikir. Bi min ra got:

- Ez kêfxweş im ku te kêmasiyên mekîneya xwe bi dest xistine û niha dixwazî vegerî mala xwe…

- Tu çawa dizanî?

Helbet ez hatibûm bi wî ra bibêjim ez li karê xwe bi ser ketime û min balafira xwe temîr kiriye!

Wî bersiva min neda û lê zêde kir:

- Ez jî îro vedigerim mala xwe…

Piştre bi awayekî xwedaketî got:

- Lê çûna wir pir zehmet e, ji ber ku ez ji wir gelekî dûr im…

Min pir baş his dikir bûyereke nexweş li pêş e. min ew mîna zareke qiçik hemêz kir. Ji min tirê ew ê bikeve nava geravakê, bêyî ku ez jî bikarim karekî jê ra bikim. Wî awirê xwe berdabû cihekî dûr:

- Berxê te daye min, bi min ra ye. Sindoqa wî jî heye. Pozbenda wî jî ku te da min…

Û bi rewşeke xemgîn bişirî. Ez demeke dirêj sekinîm. Min his dikir ew hêdî hêdî germ dibe.

- Mirovê qiçik, tu tirsiyayî?..

Helbet tirsiyabû, lê di ber xwe da kenî:

- Ez ê îşev zêdetir bitirsim…

Şahzadeyê Qiçik 85

Laşê min ji hesta qewmîna bûyereke necubranbar cemidîbû. Û ez têgihîştim ku bêpar mana hertimî ji van kenên wî yên şêrîn karekî dijwar e. kena wî ji min ra weke kaniyeke li çolê bû.

- Mirovê qiçik, dîsa jî dilê min dixwaze ez dengê kenê te bibhîzim…

Lê wî ji min ra got: - îşev durist salek e. gerstêrka min îşev tê vê nuqteya sala par ez jê daketibûm…

- Hevalê min ê qiçik, gelo çîroka mar û gerstêrka te û melteya te ne xewn û xeyal in?

Lê wî pirsa min nebersivand, tenê got:

- Tiştê esl û resen veşartî ye...

Helbet…

- Herwisa ji bo gulê ra. Tu eger ji gulekê hez bikî ku ew li gerstêrkeke din be. Çi xweş e êvarê li asmên binêrî, wê demê dibînî ku hemû stêrk tijî gul in.

- Helbet…

- Herwisa jî ji bo avê ra, ew avê ku te sewa vexwarinê da min tê bîra te? Ji ber dengê awaza werîs û dewl û çerxê, çiqas rind bû…

- Helbet tê bîra min…

- Tu yê êvaran li stêrkan binêrî. Stêrka min qiçiktir ji vê yekê ye ku ez bixwazim cihê wî nîşanî te bidim. Û wisa jî baştir be. Stêrka min jî yek ji wan hemû stêrkan e û wê demê tu yê ji temaşekirina hemû stêrkan hez bikî. Lê ez ê xelatekê jî bidim te…

Û dîsa kenî.

Şahzadeyê Qiçik 86

- Ah hevalê min ê qiçik, delalê min, ez tenê dixwazim dengê kena te bibêm!

- Xelata min jî dê ev be… wisa ku ji avê ra jî bû…

- Mebesta te çi ye?

- Her mirovekî hin stêrkên xwe hene lê stêrk ji bo hemû mirovan ra ne bi wateyekê ne. Ji mirovên ku gerok in, stêrk dibine nîşane sewa rê peydakirinin ra. Ji bo hin mirovan ew tenê weke çirayan in. Ew sewa zaniyaran ra weke raz û nepeniyan in. Sewa karsazê min ew weke zêr bû. Lê ev stêrkana hemû bêdeng in. lê te yê stêrkeke xwe hebe ku ya tu kesî tune…

- Mebesta te çi ye?

- Ji ber ku ez şêniyê stêrkekê me û li wir ez ê bikenim, dema tu li asmên binêrî ji te ra wisa xuya dibe ku hemû stêrk dikenin. Hin stêrkên te hene ku kenînê jî dizanin! Û dîsa kenî. Û dema ku hinekî aram bibî tu yê ji nasîna min kêfxweş bibî. Tu hevalê min ê hertimî bibî û dilê te dê bixwaze ku bi min ra bikenî.

Şahzadeyê Qiçik 87

Û carinin jî tu yê pencereya mala xwe ji bo sergermiyê ve bikî… û ji ber ku li asmên binêrî û bikenî dê hevalên te mat û heyran bimînin. Wê demê tu yê ji wan ra bibêjî: "ez hertim li stêrkan dinêrim, dikenim." Û ew ê te dîn biengarînin. Wê demê tu yê têbigêjî ku min henekên xwe bi te kirine…

Û dîsa kenî.

- Ew jî durist weke vî tiştî ye ku ji dêlva ku ez stêrkan bidim te, min hin zengil dabine te ku ew jî kenînê dizanin.

Û dîsa kenî û bi awayekî hinekî cidî got:

- Îşev… naxwaze tu werî.

- Na ez te tenê nahêlim.

- Îşev hinekî halê min dê xerab bibe. Wekî kesekî ku dixwaze bimire. Wisa ye de! Naxwaze tu werî û wê halê min bibînî. Tu zehmet mekişîn…

- Na ez te tenê naterkînim.

Lê ew dil bidarda bû:

- Ez dibêjim tu newere… û ji ber vê marê dibêjim. Nabê ew mar bi te bigire. Mar bedzat in. pêkane ku ew ji xwe werê bi mirov bigirin.

- Na ez te bernadim.

Lê dema ew hinekî fikirî, piçekî aram bû:

- Mar ji bo cara dudiyan ku bixwazin bi tiştekî bigirin, jehra wan bêbandor dibe.

Şahzadeyê Qiçik 88

Wê şevê dema ku ew çûbû ez pê nehesiyabûm, aram û bêdeng çû bû. Min pey wî girt û wê çaxê ku gihîştime wî ew bi gavên bilind û zûzû dimeşiya. Tenê bi min ra got:

- Oh tu jî ku hatî!

Û bi destê min girt û dîsa jî narahet bû:

- Te karekî nebaş kir ku tu hatî. Tu yê xemgîn bibî. Wisa diyare ku ez bimirim lê ev yeka ne rast e…

ez bêdeng mam.

- Tu fam dikî! Wir gelekî dûr e. ez nikarim laşê xwe bi xwe ra bibime wir. Ew pir giran e.

ez bêdeng mam.

- Ev wekî çermekî kevn li dora min pêçaye. Ji ber çermekî kevn ku mirov xem naxwe.

Ez bêdeng mam.

Ew piçekî dilsar bû lê dîsa jî hewl da min serwext bike:

Şahzadeyê Qiçik 89

- Dê wisan baş bibe, dizanî?.. ez ê li stêrkan binêrim. Hemû stêrk ji min ra bibin weke bîrên bi çerxê jenggirtî, û ew hemû jî avê ji min ra dê bînin ez vexwim…

Ez bêdeng mam.

- Wey ku wê demê çiqas dê balkêş bibe! Pêncsed milyon zengilên te dê hebin û pêncsed milyon kanî jî ji min ra …

Ew jî bêdeng ma. Ew digiriya.

- Şûna çûna min li wê derê ye. Bisekin ez gavekî din bi tenê herim. Û ji ber ku ditirsiya, rûnişt.

Dîsa got:

- Guhdariya min bike… Axir ez berpirsiyarê gula xwe me. Gelekî jar û zeîf e! Pir jî pepûk e! Wê ji bilî çar striyên bêxêr, tiştekî xwe yê din sewa bergiriya xwe li hemberê dunayayê tuneye…

Ez rûniştim, min êdî nedikarî li ser xwe bisekinim.

Wî got:

- Aha em gihîştin, vira ye de… bi dawî hat.

Bi gumanbarî û dudilî ji şûna xwe rabû. Gaveke din jî avêt. Lê min nekarî ji şûna xwe bilivim.

Min ji bilî şerqeke qiçik ku li kêlekê gwîzika lingê wî çirûskî, tiştekî din nedît. Ew gavekê bêtevger ma û weke dareke ku hatibe birîn aram kete ser erdê. Lê ji ber ku erd qûmî û nerm bû, ji ketina wî tu deng jî bilind nebû.

Şahzadeyê Qiçik 90

27

Niha şeş sal ji wê serpêhatiyê derbas dibe… min ev maceraya ji kesekî ra venegotiye. Hevalên min ku ez sax û zindî dîtim gelekî kêfxweş bûbûn. Ez xemgîn bûm lê hertim min digot ji ber westiyanê ye ku ez wisa me…

Niha hinekî aram bûme… lê ne bi giştî. Lê dizanim ku ew vegeriyaye gerstêrka xwe. Ji ber ku di rojhilatina rojtira din da min laşê wî li wir nedît. Laşê wî pir jî giran nebû..

Û dilê min dixwaze ez şevê li dengê stêrkan guhdariyê bikim.

Û ew jî durist wekî ku pêncsed milyon zengil bi hev ra…

Şahzadeyê Qiçik 91

Lê gelo bûyereke awarte dê biqewime: min pozbendek ji berxê wî ra kişand lê min ji bîr kir bendikeke çermî ji pozbendê ra bikişînim. Teqez wî nekariye pozbendê li devê berxê xwe girê bide. Ez ji xwe dipirsim: "di gerstêrka wî da çi qewimiye? Renge berxê gula wî xwaribe…"

Carinan bi xwe ra dibêjim: "teqez berxê gul nexwariye, çûnku Şahzadeyê Qiçik her şev gula xwe bi kulavê diniximand û haya wî ji berxê wî jî hebû…" wê demê ez xweşhal dibim û hemû stêrk jî bi min ra dikenin.

Geh jî bi xwe ra dibêjim: "di encamê da ew ê gavekê xemsar bibe. Û ew gava jî bes e! ew ê şevekê ji bîr bike û ser gula xwe bi kulavê neniximîne yan berxê wî ji sindoqa xwe bêdeng derkeve…" wê demê zengil dê bibin hêstir û girî!..

Û li vir razeke mezin jî veşartî ye. Ji bo ku hûn ji Şahzadeyê Qiçik hez dikin û herwisa sewa min jî, tu tişt girîngtir ji vê yekê nîne ku em bizanin li cihekî nediyar, pezeke nenas, guleke swîr xwariye ya na…

Li asmên binêrin û ji xwe bipirsin: - gelo berxê gul xwariye yan na? hûn ê bibînin ev mijara çiqas ferq dike…

Û mirovên salmezin dê nema têbigêjin ku ew mijara çiqasî girîng e!

Ev dîmena bedewtirîn û xembartirîn dîmena cihanê ye, ev heman dîmen a rûpela berî vê ye. Lê min ev careke din kişand ku ez vê baş nîşanî we bidim, cihê Şahzadeyê Qiçik dakete ser erdê û ji dû ra jî wenda bû, vir e.

Şahzadeyê Qiçik 92

Bi baldarî li vê dîmenê binêrin, ta eger hûn rojekê çûn afrîqayê û we sehra dît, bawer bikin ew der ji we ra nasyar e û hûn ê wir nas bikin. Û eger rojekê hûn bûne rêwiyê wê sehrayê, xwestekek min ji we heye; hûn lez nekin û demekê li bin wê stêrkê bimînin. Wê demê eger zarokek rû li we hat, eger ew kenî, eger porê wî zêrîn bû, eger wî bersiva tu pirsên we nedan, hûn ê wî nas bikin. Û wê demê ji kerema xwe nehêlin ez wisa xemgîn bimînim: lezgîn ji min ra nameyekê bişînin ku ew vegeriyaye.
**

ŞEVÊN SAR

Roman

Hesen Îbrahîm

(1)

Gond yê didanga çîyayekê birisî û rût da nivisitî.

Pitir jibîst mala dikawdanekê giranda dijîn.

Xanyên wan jiaxê û pûşî dirust kirîne.Ne kahreb û ne rê û rêbarin.Ne xwandingeh û

mizkefte.

Çu rûbar û kanî rûyê gundî geş nakin.Warekê hişik û bê dar û bar û şînkatîye.

Hemû yên li hîvîya mirinê..Yan rûdaneka mezin.Da kulkên wan yên nîv herftî,bikite qesirên

helankirî.

Çend bihusteka jigondî wêve kanyên gazê biser erdî dikevin, lê nihu gondî hemûyê tijî

fanosekê gaz têda nîne..!

Şivanê gundî yê biçavekîye,gavan yê seqete.

Jigundî hemûyê,dûsê mal biçûkên xwe dihinêrine xwandinê libajêrê....!

Karê gundîya,mirêbatîya axayekê bê dile,çend mistên genimê havînê kum kirîn,dikine

savar,lizivistanê liber supa dara dixon.

Hîvyên hemûya stewrin,kes xema paşerojê naxot.destê kesê nagehite dergehên

Mirada,bêkarîyê hemû yên xesandîn, dûr jibajêrî,dûr jicihên jiyanê,dûr jiavedanîyê,hemû

yên wek peykera hişik kirîn..

Dîtina bajêrî,bû geleka Mirade,xwandin bû hemûyan xewne.hêşta kesê jigundîya berê beytê

maç nekirî ye.hêşta dengê para jipaxla kesê nehatîye..

Turmbêl her çend heyveka nesaxekî,yan polîsekî dînte gondî..

Hemû yên lihîvîya rojê da niqon bit û lidûr sopeka gerim guhdarîya mîrzu bikin.Ne hay

jidinîyayê mayne,ne mayê xwe diramîyaryê dikin,ne ayatên pîroz jiberdikin,ne pertuk û

rojnama dixwînin..

2

Tinê hemû dizanin,ka şivêdî mîrzu çîroka xwe likîş beytê bidawî înaye.!

hebû,nebû,kes jixudê mazintir nebû,kes jibenîya direwtir nebû..

Em şivêdî gehiştbûne..

Deh denga pêkve gutin:

em gehiştbûn,demê çavê memê alan bizîna zêdan ketî dipencera qesirêda..

Mîrzu dûsê cara cihê xwe xweş kir,ewên lirex û rûya.xwe jihemûya bibext tir didîtin,Balîfik

diheşandine diber teniştên wî ra û mîrzu vêra çû...

kes nizanit,husin û cemala zînê heta çi rade ye?!

Heyiv şerim jixwe dikit,roj jiber şewqa wê xwe vedişêrt....!

Her wekû gundîya murikên xewê danayine ser sîngê xwe.

Biçûk didangên dayikên xweda dixew cûn.tulaz man mendehuş.herêkû xwe didît mem û

yara xwe didît zîn..

Hemû wek peykera man bê gîyan,çavên wan yên lidevê mîrzuy,ka dê çi ayatên pîroz jê

derkevit?

Karu berx man ne mêtî.ker û dewar man bê Alif.rûvî ketin kolkên mirîşka,pişîka mast jibin

pata înane der.dinîya xirab bit,bû kesê ne xeme,tinê çi peyv,çi livînên mîrzu jikesê ne çin..!

Mîrzu yê biherdû desta livîn û xebatê dikit,bînerên xwe bi banê peyvên xwe ve hêlan

hilawîstî.hemû yên bûyne êxsîrên peyvên wî..

Sipêdê rabûn,çend bihusteka befir ya barî...!

(2)

Liwê hola mezin û pirî mirov,digel Mamustayên xwe yê rawestîyaye..

Çend xwendikarên zankwyê yên bû desta diqutin.

Serukê zankwyê,destê xwe dana ser milî û bidengekê bilind gût:

em jidil pîrozbahîya xoe û ya vî xwendikarê zîrek û serketî dikin.ew serkêşê zanist û

meirîfetêye lizankûya me.hîvîdarim hûn hemû wek wî diserketî û xudan şîyanên zanisitî

bin..

Bidestê dî bawernama serketinê kire didesitî da...

Hol tijî dest qutan û keyif bû.devê yara wî na kevite serêk jikeyfa.

Ha ha dê xwe jikuma mirova havête dinav sîngê wî da....!

3

***

Destê xwe limilî da

divêt tû vê hola mezin hemûyê baş bimalî,û van şîşên pencera jî hemûyan baş paqij

bikî,hemû mêza pate bidî,û van xwelîdanka bişoy,û cihê destavê baş paqij bikî.Heta ez

bizifirim,divêt te ev kare hemû kiribin,heker tû kure bibî,êk filsî nabînî....!

Bişkurîn hêşta liser lêvên wî ma bû,lê demê ew gêzik û hindek alavên paqijkirinê kirîne

didesitîda,rengê mirîya girt

(3)

helo,tû çewanî? Başî?

gelek başim,hûn çewanin?

em hemû dibaşin,pirsîyara halê te dikin?

dayika min?Babê min?Rewşa wan çewaye?

tû çi dikî?Ma tû naêye seredana me?

min gût dayik û babên min diçewane?

ê,..niza..Niza çi bêjim?!

çi bûye?Dîyare dinesaxin..?

berî şeş heva,herdû ne mayne...!

(4)

4

Bajêr yê berfireh û bê dawîye.gelek jixelkê wî,hêşta dawîya wî nedîtîye.

Wek biçûkekê sava dikuşa dayika xweda yê nivîsitîye,kes bawer nakit ku ev bajêre tijî

mirove!

Êkşemb,roja bêhn vedanêye.kes çu kara nakit,hemû yên dixeweka giranda,dikoşên yarên

xwe da nivîsitîne.

Livîn jiçu gîyanewera naêt,baran nabart,kutir nafirin,se na rewin..

tinê ew yê hişîyare,wê berê sipêdê,wek her roj.xwe rapêçaye û kulanên bajêrî bihust bihust

dipîvit!

eve çî ye? Ka mirovên vî bajêrî?Kîve xwe veşartîne?Nê dûhî bû livan kulana cih nebû

jimirova?

Kesê bersiva wî ne dida,tinê dengê xudanê karî ser lê diwermand..!

subehî ez te liser karî ne bînim..

tû ne zelamê karî..Tinê karê te nivîstin û xwarine,wek sey..

Serê xwe dihejand û didilê xweda digirîya,car jî girîya wî dibû bişkurîn,demê hizra dibire

rojên zankwyê..

em hemû bite diser ferazin,te serê me bilind kir,tû dê bîye şemalikeka geş dirêya hevalên

xwe da..!

Carekadî dengê xudanê karî ew hizir belav dikirin..

— Çu cîyawazî dinavbera te û ya seyekê pîr da nîne..!Tinê nave,ne ne,se gelek jite

baştire.se çu xirabîya nakit.Tû berazî, beraz..

***

— Her tiştê te divêt...Her cihê te divêt.. .Em dê bote amade kin.dê hemû daxwazyên te bicih

înin,da tû bidiristî karê xwe bikî..

Welat,millet pêtivî kesên wek teye!

***

subehî ne êye karî.. Ez te livara nebînim..!

***

5

Şev biserda hat,carekadî liwê jora bû wî bûye gor veheiya..

Lê ma dê çewa hedara wî êt?Ne kare,ne paşeroj.

ne hevalin,ne kes û karin..

Dest da qelem û kaxeza,neşîya çu binivêst,wan kitêbên jigîyanê xwe xuştir divîyan,liber

çavên wî bibûn dûpşik, telefizîwn neyarê wîye,telefunê babê wî dayika wî herdû kuştîne..!

Lihêf û balîfk,goristaneka tarîne,tinê,tinê sebra wî û hevala wî,ew şîşa votkayê ye.Gelek

cara pêkve diçine gerîyanê û seyrana,gelek şeva heta berê sipêdê dest digerdena êk

diwerînin..!

Tinê ew votkaye,wî dibite beramberî xudana pirça dirêj, tinê ew votkaye wî dikite mêvanê

wan her dû çavên mê, tinê ewe,wî heta berê sipêdê liser sîngê wê dinivînit wek biçûkekê

sava,tinê ew votkaye tinê ewe...!

(5)

- Helo.. Roj baş

- roj baş, keremke?

- Ezim.. Ez azadim..

- Belê kak azad keremke?

- Tû çewanî? Başî?

- Supas,em dibaşin.Keremke te karek,xizmetek heye?

- Tinê min divîya goh lidengê te bigirim.

- bibûre,zelamê min limal nîne.Tû dişêy telefuna wî liser karî bikî.

- Ne ne,min divîya digel te baxivim..Goh likenîya te bigirim.

- Bilê?!Te çi gût?!

- Çine,hema baxive,bikene,behsê xwe bike.

- Bibûre,ez dimerema te negehiştim?!

6

- Te ageh jimin nîne!Çu nemaye ez dê har û dîn bim..

- Jiber çi dê har û dîn bî?!

- Jiber te..!

- Jiber min?!

- Erê jiber te..Jiber çavên te..Jiber pirça te..Jiber kenîya te..

- Raweste,raweste..!Dîyare te tiştek vexwarîye?Te ageh jixwe nîne.ma tû nizanî ez ya

bimêrim û xudan biçûkim?!

- eve hemû bû min ne xemin.Tinê xema min,tû bû min hindek bikenî,da dilê min tena bit..!

- ez bawerim tû ne yê dirustî!

- te rast gût,ez evîndarekê haru dînim.Bişev tû nahêlî ez binivim..Bi roj tû jipêş çavên min

naçî..!

Kenîyeka ter tijî mejiyê wî bû,hemû endamên leşê wî nêr kirin.ew destê dinav pêsîra wî da

har bû,berî telefonê danit, gîyanê wî jidil tena bû.

Qesta serşoyê kir.Wê şevê gelek tena nivîst...

Sipêdê zû dest da telefonê û careka dî xodana pirçê jixewa şirîn hişîyar kir.

Eve bû karê wî.heval jibîr kirin,mala xwe jibîr kir.

lişolî negerîya,xew nema,tinê ma lihîvîya delîvekê,heta zelamê wê jimal biçite derê,da ew

qesta telefonê bikit.Da gîyanê xwe bû demekî têr bikit,da xemên xwe bû çend çirkeyeka ser

jê bikit!

Ew telefon dibû alifê gîyanê wî,leşê wî dişîya pê bijît,jiyana wî bidûmînit.

Lê dîtina wê bibû xewin,hîvî.çu tişt neman xebatê bû bikit, tinê dîtina wê.rawestîyan

libersîngê wê,hemû xebata wî ye!

(6)

Liser depê dîskûyê,wek meymûnka dinava wê heşameta mirova da,dileyîzit,liber muzîka

"rock"milmlanê û bablekan dihelînit....!

Ew muzîka bîyanî liber guhên wî bibû dehol û zirna.awazên filklorî jê dibarîn.

Gencatîya wî dûbare dibû.Ew tinê serkêşê dîlanêye,çend kiçên gondî lewindyên xwe bû

dihejînin,yara wî liber dîwarê mala xwe çafzlkanê digel dikit.lêvên xwe dinav didanên xwe

da dihêrit!

7

Her dehol û zirna dişaryêt.her govend diazirit.

xuha leşê wî zêde dibit,gîyan har dibit,hest nêr dibit.

Kitkte depê dîskûyê vala kirin,cih bû wî bitinê ma....!

Hemûya dest bû diqutan,lidûr kum bûn..

Muzîk bilind bû, ew har bû,bîner zêde bûn,ew dîn bû,ronahî dileyizî,wî milên xwe kirine

şema.Wek zarvekerekê şareza liser depê dîskûyê rolê xwe bidawî îna..

Pitir jinîva bînera hatine destê wî.û geleka xwe dinav Sîngê wî da şidandin û divîyan wê

şevê liber tenişta wî binivin....!

(7)

Gondî hemû yên jikevlujankê xwe derketîn.Kes nemaye linav gondî,hemû libinê kutana pezî

dikumin.

Simko yê şivan.pez hêla dikutanê ve,ûn bibilura xwe serê gondîya hêr kir.

Reşo yê gavan.garan hêla digova ve û teneka avê ya kirîye dehol..

Mîrzo biliblê gondîye,jivî çeqî diçite çeqê dî.bistiran û lawik û heyrana gondî hemû

mendehuş û serxweş kirîne....!

Çucar hosa keyiva wan nehatîye.wan gewriyên eve çend salin tilîlî jibîr kirîn,eviro bibûn

pîkên zirnayê.

Tulazên gondî,xwe xwarin,kiça lewendiyên xwe dicûyin, pêsîrên şelên zelama vebûn.

Seyên gondî direwîn,pişîka çûçkên kurka jikulkî dizîn.Ker hinşerî bûn hindî xodana ceh

dana ber,da bela wan jixwe vekin.

Dîkil û mirîşik necone lîsî.Hemû gîyanewerd serxweşin,livê gondî.

Eve ne ew gondê carane!Eve ne ew gondîne...!

ez êdî şivanîya gondî nakim.Dê bime zêrevanê azadî,dê digel wî çime bajêrî,hebit nebit dê

bite tiştek gelek mezin....!

— Şivanê pîs,jipezî pêve tu bikêr çu naêy.Ezim xudê bû zêrevanîya azadî dayim.Ezim jibû

xizmeta wî amade!

Gelekên dî didilê xweda xwe bû wî dikirine erd û geleka hîvî diçavên wî da didîtin..!

8

— Dê rêya gondî kite qîr

— Dê xwandingehê înite gondî

— Dê mizgevtê ligondî avakit.

Gelek kiça paxlên xwe diperxandin,xwe liber tenişta wî wek bûk didîtin.

Heyranuka mîrzoy,hizirên hemûya birine nik wê teneka linav koma mirova,ewa azad liser

roniştî.

- Hey lû.... Hey lû....Lawkê gondî

Hey lû.. Hey lû..

Jibejna te tê ew bedlle ye..

Jinavê te tê bawer name ye..

Çavên kiçên gondî lirêya te ye..

Hey lû.. Hey lû...Lawkê gondî..

Demê taryê xwe biser gondî da girtî,bişkurînê gelek lêv girtin.

— Dê her kahrebê bû gondî înit..!

Hemû pêkve limala muxtarê gondî liser sifira xwarinê kum bûn.

Wê şevê azad bibû mêvanê xewa bahira pitir jikçên gondî..

Gelek jinên bimêr,wê şevê liber teniştaxwe didîtin.

Bû gelek tulaza bibû hîvî û mînak.

Wê şevê navê wî liser dû biçûkên gondî kirin,wê şevê sê biçûk dikuşa wî sininet kirin.wê

şevê jiber xatira wî, elo û qado pêk hatin.wê şevê heta berê sipêdê yara wî xew nedît.wê

şevê fanusa mala babê wê heta nîviro ma hil.....!

***

Wê şevê,wek gelek şeva,li wê meyxana wek şikevta û liwî cihê her car,û liser wê kursîka

bitinê û wê mêza biçûk.her wekû bû wî dirust kirîn,û likujiyekê tarî danayin.yê royiniştîye.

Rengê wî yê pêtî,berûka wî ya vala,mêza wî ya birsî.

Çu jin temaya xwe na bine dîwana wî.

Her yê bitinêye,hevala wî,dusta wî.ew şûşa votkayê ye.ewa jihemûyan erzantir.

9

Serê xwe bilind kir,meyxane pire jimirovan,liher kujiyekê wê şikevtê,cîhaneka taybete,kesê

ageh jikesê nîne,her êkî ageh jiwê heye,ewa dikuşa wî da,ewa dinav destên wî da, wek

gilomckeka befirê dihelyêt.

Tinê ew yê bê hevale,tinê ew yê lêvên xwe dixot.

Çavê wî bibanê meyxanê ket,hizra bire şikefta gelî.Ewa çend carekê deng jidevê tivengekê

dihat,gondîya hemûya qest dikirê û têve dihatin xudan kirin.

Her malekê jigondîya cihê xwe hebû,lirojên nexweşîya liwan dibû stare,jiagirê şera

diparastin,û jiserma zivistanê jî ne ditirsîyan.

Mala wan birex mala muxtarî ve bû.muxtar xodanê dû jina û bireka biçûka ye.

Cihê wi bi rex mala muxtarî ve ye.jitengavîya cihî.hemû yên kirîne êk mal,gelek şeva xew jê

direvî,taybet demê muxtar dinîva her dû jinên xwe da dinivîst.Linîva şevê û pêda,dibû şerê

herdû jina liser sîngê muxtarî.

Gelek şeva çav zilkanê dikir lidemê muxtar dikelixê jina xwe ya biçûk diçerî,wî jî liber

gohnêlîya muxtarî leşê xwe dixwar.

Liberê sipêdê demê muxtarî cinabet liser xwe ra dikirin.wî jî mesînekê ava tezî lileşê xwe

dikir.

- Te xêre mamu? Çi xudê jite standîye vê berê sipêdê û vê sermayê tu xwe helal dikî?!

Kenîya muxtarî tijî wî gelî dibû,bişkurînê lêvên wî jî digirtin.

Dengê kenîya wê jina dikuşa yarê xwe da,hizirên wî jişikevta gelî, înane wê meyxana

kevnar.

Jin ya nîv rûse dikuşa yarê xwe da,yar her wekû pilingekê birsî berdîye dinaf qerqodê

xezaleka kûvî da.Ha ha dê xut, dê daûrit,çu ne maye lê nekirî.

Ew yê dengê gohnêlîya xwe bilind dikin.

azad yê dikevilojankê xwe da dihelyêt.Her kenîya wê jinê mê dibit,her azad nêr dibit,her

votka mejyê wî xav dikit,her deng nêzîk dibit.

Diwê berîkana dengê mê û leşê nêr û votka dijwar da.

Hest gehişte pila xwe jibîrkirinê..

Dest da pêsîra xwe û lipêş çavên hemûya,kirmê mêranîya xwe bidestê xwe şikand....!

Meyxane tijî kenî bû,hemûya bû dest qotan,û bî pêtiranik..

Dû zegzega milên wî girtin,jimeyxanê birineder,her êkî pêhnek lê da û jiwî cihî dûr kirin..

***

Cade hind ya dirêje.binê wê ya libin bêt wî, û serê wê ya bizikê esmanî ve.

10

Esman,wek bûkeka sile,hindek ewra royê wê kirêt kirîne.

Belgên dara wek befira zer lêvên cadê nexşandîne, zeratîya belga rengê şevê gohartîye....!

Libin her çend dareka,dû evîndar yê guhnêlyê dikin.

Serma,polîsekê kirête,her zû hemû evîndar dakirine dijor û meyxana ve.

Serê wî yê tijî..Hizirên belav kirine rastî.gelek çara bişkurîna lêvên wî dibû kenî,kenîyeka

bilind.

Demê dibû mêvanê pîrejineka têr.Piştî jirazî kirina wê xilas dibû,tijî berûka wî pare dikir û

digût:

— Subehî zû were, bila?

Kenîya wî dibû hewar û xeber,demê hindek tolaz bikenîya wî dikenîn û axivtinên kirêt

digûtinê..

Cade hêşta yamay,şev,hêşta yamay,kesên wek wî tijî ber dîwarane.

Leşê wî her yê giran û bê hêz dibit,serê wî her yê sivik û belav dibit.çavên wî her yên tarî

dibin...!

Kuxî..Kuxka wî vê carê jikûratîya dilê wî derket.

Gelek kuxî,sor bû,reş bû,rengê wî pêtî bû.

Dema tif kirî,tameka dî jitfa wî hat.ne ew tama her car bû, lê tarîya şevê û çavên nîv

nivîsitî,rengê tifa wî jirengê şevê coda nekirin.Tama tifa wî ne ya xerîb bû,ev tame gelek

cara tam kirîye.çend carekê ketîye girtîxana dojmna.çend cara jî sera wê kiça cîrana wan

dibû şer û lêkdana wî digel tolazên dî.Ew tam dikete devê wî.wê gavê ew tam liber devê wî

gelek xweş bû,dizanî eve bihayê xwe ragirtinê ye. eve bihayê evînê ye,eve baca welatî ye.

Lê vê carê ew tam newesa xweşe.ew tam ya dil reşe.keyif pê naêt.dibit jiber vê carê ne

bihayê çu welat û çu evînaye dibit vê carê tinê sizayê mejî hişkîya wî ye. Lewra tama wê tifê

ya dil reşe.Wek reşatîya şevê.wek reşatîya cadê.wek reşatîya paşeşojê.....!

(8)

— lidûf yasaya vî welatî,her kesê karekê dijî berjewendîya giştî bikit,her kesê direwa lipolîs

û karmendên hukmetê bikit, dê ête siza dan.

Her jiroja êkê tû hatîye vî welatî.te binavekê direw û nasnamên direw,xwe bû me daye

nîyasîn.te xwe kirîye ereb,jidevera bin destê rijêmê.

Piştî salekê bû me dîyar bû,eve hemû neweye.Te zankûya xwe hêla û te karê xwe hêla,û tû

toşî kêşana dermanka bûy.

Piştî çend agehdaryên polsa û çend sizaya,te navê xwe gohart.

11

Liser van direwa hemûyan,tû divê salê da deh cara ketîye destê polîsan.

Pêniç cara jiber şer û dijatîya digel xelkî.

sê cara jiber şolê reş.

dû cara jiber derçona te jiwê bazna bû te dîyar kirî..

Ev hemû karên ne dirêdanin.Liser te bihisabin.piştî siza para hatîye ser te,jiber wan karên

tekirîn,tû careka dî demê salekê berzebûy.

Careka dî polîsa tû dîyar kirî binavekê dî û bihindek nasnamên dî.

Te vê carê xwe kirîye fele,piştî tû cara êkê îslam bûy.

Tû hatîye zifirandin bû kempa berê,te dest jikarên xirab ber nedan.

Te dermanik firotin.te dizî kirin,te şolê reş kir,û cara dawîyê, sê kîlogiramên hêrwynê didest

te da hatin girtin....!

Serê wî neşîya xwe liser mila bigirt,dinîya lipêş çava zer bû.

Berê xwe da cihê deng jê diêt,lipêş çava bûne gelek dev. Ew xaça lihindav serê dadwerî,bû

sêdare,werîsekê zifir şor dibû diketestoyê wî!

Hol ya biçûke,liber sîngê wî.dadwerekê sereye,lirexên wî.dû polsên reng efrîtin.lipişt wî

parêzerekê bê zimane.lihindaf serê wî ziman zaneke.

Diwan çend çirkeyên dadwer jixwandina gonehên wî xilas bûy.serê xwe bilind kir,zanî

likîveye!

Berê xwe da parêzerê xwe.parêzer çu nemaye dê lêvên xwe liber didanên xwe hêrt!Berê

xwe da wan polîsa.polîs wek peykeranin.

Serê dadwerî yê dinav kaxeza ra..

Tinê ziman zanî bişkurîneka şermîn kire dîyarî.Lê dengê dadwerî hemû livîn serjê kirin.

Liser milê xwe yê rastê û yê çepê zifirî.

Binavê gel....Ev birîyare diderheqê te da hatin dan:

Tû jimafê penaberyê hatîye bê bar kirin.

Tû jihemû kaxez û pênasên vî welatî hatîye bêbar kirin.

Demê sê salan hatîye zîndan kirin.divêt divan sê salan da di girtîxanê da bimînî.

Polîsa mavê zifirandina te bû welatê te heye.lê jiber destûdarê welatê te.em dê birîyara

zifirandina te ragirin.

Parên dadê û yên polîsa û yên ziman zanî û yên parêzezî, hemû liser tene.

Te hinde têbînî,yan ne razî bûn hene?!

12

Dengê dadwerî liber goha yê şêlî bû,çu denga neşîya wan hizirên diserî da bisimin,dengê

Mamustayê wî bilind dibû:

- Tû her dê bîye kesekê navdar!

- Hişîyar be! Me jibîr ne....!

- Şîyanên te jiyên Mamustayên te pitirin!

Dû polîsa milên wî girtin û beref bin erdî birin.

***

Destê wî yê biçûk,yê didestê dayika wî da.dayik ya dibezit, dehmenên xwe hildayine

binkefşên xwe. û ew kifnê reş lidûr teniştên xwe pêçaye.biher dû mila ya xwe dinav wan

mirovên tijî ber derê girtîxana "eboxirêb" diqutit.cihê xwe dinav kuma wan da dikit!

çend xelkê wî welatî,eviro liber derê vê girtîxana Kirêt kum bûyine.Eve karê wane her çend

heyiva carekê,diêne seredana mirovên xwe,ewên bê goneh,hatînegirtin.

Çu nemaye dê destê wî yê biçûk jimilî ête hilkêşan.

Her dayika wî ya dirakêşit,her ew yê dibezit.Heta gehiştîne ber dergehê serekî.

Girtî hemû libenda mirovên xwe ne.Dergeh vekirin.wek berxên berdayne ber pezî.her êkî

qesta mirovê xwe kir.

Liwî cihê gelek hîvî lê çandîn,ketin beramberî êk.

Çavên jixerîbîyê kil bûyin.dilê evîndar,jina pêtvî mêrê xwe.

Çavzlkanê kirin,destên wan wek tevnî têk hatin raçandin.

- Em bûte dîn û har bûn..

- Ez hizar cara pitir.

- Kurê te pirsîyara te dikit.!

Serê xwe yê biçûk bilind kir,çavên babê wî tijî evîn û tijî hîvî ne!

- kurê min,bibûre eve min bixwe ho nekirîye!Min çu karên

xirab nekirîne.Em bin destin,min xebat kirîye,şoreş kirîye..

Serê xwe çemand,berê xwe jibabê xwe gohast.

- divêt tû rastyê bû wî bêjî...Rastîya jiyana me.welatê me.

- ez her dibêjmê,babê te xebat kere,babê te şoreşgêre,lê ew dibêjit,min çu şoreşgêr

nevên,min babê xwe divêt....!

13

- Ne ne, kurê min,jiçirîska êkê ya şoreşa eylunê,bapîrê te digelida bû,wî digût,em yên

bişoreşekê radibin,ne bû meye, û ne bû korên meye.lê dibit nevyên me berhemê wê bixon.

Helbet ew şoreş ya fere..!Iha nihu tû nevyê wî,ez bawerim tû dê berhemê wê şoreşê xuy..!

Serê xwe dîsan bilind kir,didilê xwe da daxwaza lê bûrînê ji babê xwe dikir.devê babê wî tijî

kenîye,hêşta tilên dayika wî dinav tilên babê da diveşartîne.

Kenî û girîya jigirtîya û kesên wan bilind dibit,hizirên wî belav kirin.

Dengê polîsê mirinê,hemû tişt ser jê kirin,hizir mirin,hîvî man hilaoystî.

- seredan xilas!Dê her kes karê jiderve bikit,û girtî qesta zîndanên xwe bikin.Dê, dê lezê

bikin..

Her dû cûn dane ber dar û qamçîya.wek şivana,berx û pez jêk cûda kirin..

***

Şeq şeqa seqatên dergeha,kêşa cîhana rastyê,lipişt çend dergehan,lijoreka pirî mirov kire

mêvan.

- eve cihê teye,eve jî hevalên tene..Biburin,eve hevalekê nûye bû hewe,navê wî azade,hîvîye

hûn bixoşî pêkve bijîn.

Gelek denga bixêrhatina wî kirin,lê bû wî ya jihemûyan seyir tir,gelek deng bizimanê wî

bûn....!

Kartêkirina birîyara dadwerî,hêşta serê wî berne daye.lê dengê babê wî biser hemû denga

zal bibû.

- ez ne dizim,ez ne mirov kujim,ez şoreşgêrim,ez xodan welatekê bin destim,divêt tû

şanazyê bimin bibî..!

***

— Te dizî kirîye,te şolê reş kirîye,te direw kirîne,te dermanik kêşayne..

***

Şeva êkê liwarê nû,xew sil kir,hevalên wi hemû nivîstin.ew ma hişîyar,wek zêrevana

lihindav wan kelexên gelek westîyay!

Mêvanên vê jorê,hemû bîyanî ne,kes xelkê vî welatî nîne. Jidîwara dîyare.vê jorê gelek

mêvan hewandîne.bihemû zimana nivêsîn û bîrhatin nexşandîne.Lê tinê hindek nivêsîna

sernca wiî rakêşa..

(ax welat,bijî kurdstan,bijî ala kurdan.evîna min,dayika min. babê min)

14

Zanî gencên welatê wî toşî çi vayiros bûyine!Zanî welatê xelkê bû kesê na bit welat..!

Dengê mîrzoy bilind bû:

Hey lû, hey lû

Lawkê gondî..

Ewê birex ve,hizirên wî belav kirin:

— Tu bû na nivî?

- xewa min naêt!

- dê westyêy...te ne gûte me?Jiber çi tû yê girtî?Çend sala....?

- sê sala..Ne jiber çu..!

- bawer neke livî welatî mirovek bê eger bête girtin!

- tinê ez bê eger hatîme girtin.Jiber min ageh jixwe nîne ka ez çi dikim!

- Ew çewa?

- Belê..Min hemû tişt hêlan.jina xwe,biçûkên xwe,welatê xwe,dayik û babên xwe,û bidûv

kiçeka ros ketim.

- ê?

- Wê jî texsîr nekir,ez vêrî hemû tişta kirim.dizîya,dermanik kêşanê,şera,şolê reş.û

lidawîyê,ez hêlam û berize bû!

- Ma te çewa gohê xwe da kiçeka wesa?

- Jicwanîya wê min ageh jiçu nebû.tinê ew razî biba.çi biba bila biba!

- Û biçûkên te likîve ne?

- Niza..Eve çend sale min ageh jikesê nîne.Ez bawerdikim yên limila birayê min.û tû?Tû

jiber çi livêrêy?

- Binive,binive,şev dimişe ne,em dê gelek sohbeta kin!

Balîvik bizotekê agirîye.lihêf kevilê jijî ye.ew textê asnî,ewê dinîva dû textên dîda,bibû

Girtîxaneka dî dinav wê girtîxana kirêt da.

Dilê jar û mejyê westîyay û leşê lawaz pêtivî nivistinê ne.

xew bixwe bibû dojmin,ditirsîya binivit,neku ewa biserî hatî bibite rastî,nedivîya çu tişta

bawer bikit!

***

15

- tû herdê bîye mirovekê navdar

- te serê bine mala me bilind kir

- te şîyanên mezin hene

(hey lû, hey lû..Lawkê gondî)

Dehol û zirna esmana disimt,çend xelkê gondî û gondên dewrubera ligondê wan kum

bûyine.

Babê wî wek tawsekê nêr,xwe qiş kirîye,biserê tilên xwe bixêrhatina mêvana dikit.her

çendekê şeqênê jitizbyên xwe dînit.

Birayê wî ala Kurdistanê didestî da ye û serê govendê bernadit,her çendekê destê xwe

dibite paxlaxwe û paxla zirna bêjî tijî şabaş dikit

Zirna bêj haha dê zirna xwe daurit!

Xoşkên wî,wek pelatînka ew govend xemilandîne.pismam û kur xala serê xwe xwarin,xwe

hêr kirin.Kiçên gondî û yên gondên rex û rûya,haha dê jikerba peqin.Lewindîyên dayika

wî,ketine bin pên dewatîya!

Hemû dimestin,meya serketinê vexwarîye,gond yê buye parçeka orkêstira yê.

Heker nihû gond bikavil ve,bête dizîn,kesê ageh jê nîne.

Yê dinîva rû sipîyên gondî da wek peykerekê navdar, herçendekê pîremêrek devê xwe

dibite bin gohê wî û pêk ve dibite kenîya wan.

Wan rû sipîya jî pê xweşe nihû birex wî ve dirûniştîne,kes cihê xwe ber nadit,da kesê dî ne

ête cihê wî.bila her mîzildanka wî ya tijî mîz bit!

Zirna sivik bû,hemû bileyizuk ve beref zavay hatin.

geleka milên wî girtin û birine dîlanê,ligera duwê ya dîlanê, lewindîyên kiça liesmana xwe

dixwarin.Dengê demanca Mamê wi biser dengê hemû çeka diket.

Nihû demê bûkê ye. bûk înane destê wî.dû sê ya pêkve xwe lidestê wî didan û wêne digel

digirtin.

tilîlîya û dengê zirnayê liesmana gohnêlî dikirin,genc har bûn,kiç şêt bûn,çend jin û mêrên

liwî gondê,hemû înan destê êk.alekên zirnabêjî bûne puvdanik,paxlên wî jişabaşa pir bûn.

Hemû dixuha xwera bênivêj bûn.Divîya kasêt zû bidawî bêt.

Hizira bire şeva zavatîya wî.hizir har bûn,nêratîya wî dil hişîyar kir,kasêt dûbare bû,liber

sîngê bira zavay rawestîya.

- Tû dizanî dê çi kî?

- erê.. Ma ez biçûkim?

Dergeh vekir,ew hîvîya jiyê xwe hemûyê kar bû dikir,ya lihîvîya wî.

16

Silav kire wê nêrgza jinû geş bûy.Silava wî bibişkurîneka şermîn ve wergirt.

Deng jidehol û zirnayê nehat,pist pist kêm bû,ronahî hemû hatin vemirandin,hatin û çûn

nema,bê dengîyê xwe biser jora wanda girt,tinê dengê awazên dilê wê dihate goha..

Dengê hatin û çuna bira zavay zêde bû,gohên wî digezandin.

Berî zirna bêj liberderê jora wî,serê zavay bêjit,û berî ser subehîya wî pîroz bikit.Şeq şeqa

seqatên dergeha hişîyar kir.

Rabû ser xwe,da xelatê zirna bêjî ditê,serê wî bibanê textê diser wî da ket,hate ser rastîya

jiyana xwe.

Careka dî xwe dinav gelek mirovan da dît,gelek çav û gelek deng û gelek pirsîyarin.

Hindî linav wan serû çava gerya,tizbîyên babê xwe didesta da Nedîtin,nemîrzoy lawik û

heyiran pê digotin,ne muxtarî berx bû ser jê dikirin!

Hemûya divîyan çend demjmêreka lidîwana wî xwe jibîrve kin.

Hemûya divîyan rastîya jiyana wî bizanin,hemûya divîyan bizanin ka çi jidervey wê jorê

heye?

Ezmanê wî axivtin jibîr kirye,lêvên wî livîn jê naêt,hêşta jizfiroka dadkirinê rizgar nebûye!

- navê min serdare,ez dûsala yê girtîme,min qaçaxçî dikir.

Û te?Te çi kirîye?

-.....

- ez şeş heyiva..Min kêrek likurekê elman da lidîskoyê.lê cihê daxêye ne mir!Dûheyiv yên

mayin,dê derkevim.

-....

- bira,hema bêje,te çi kir bit bêje,şerim neke!

Ewê he tirîyak difirot,ewê dî pitir jised şera kirîne,evê nivistî, çend parên dinîyayê liserin û

şolê reş û gelek tiştên dî,evê liqolaçê.kiça xwe kuştîye,kiça wî bidûv êkî reş ketibû!

Devê xwe bire bin guhê û bidengekî nizim:

-tû wê he dibînî?

Bêy çavên xwe jinav destên xwe bînte der.

- ew tirke.ew dinav nivîna kiça xwe nivîsitîye!Erê,erê livî welatî hemû tişt rû didin.Vêça ka te

çi kirîye?Hema bêje şerim neke!

Serê wî çend giran bû,girantir bû.Ew hizirên diserî da kum bûyin.hemû carekadî

revîn.çavên wî jixew têr nabin....

"- tû dê bîye mirovekê navdar..

17

- hevalên te hemû dibijarene..

- paşerojeka geş lipêşîya te ye..!"

Pirsîyar zêde bûn,kenî bilind bû,şeq şeqa seqata guh disimtin,serê wî nema liser

mila,divîya binivit,dibit carekadî linav mirovên xwe û ligondê xwe bibite mêvan,bibite

zava..!

"- evê he tirîyak firotîye..

- ewê he qaçaxçî bû

- yê dî kiça xwe kuştîye

- min dizî kirî ye

- kabirayê he dinivîna kiça xwe nivîsitîye

- evî hizar şer kirîne

te çi kirî ye?

te çi kirî ye?!"

Xav bû,bê hêz bû,çavên wI tarî bûn,tinê şîya pişta xwe bidite wî dîwarê sar..

(9)

Sipêde baş.

Bişkurîna lêvên wê,tîrên çava,pêlên zêrîn yên pirça wê, befira xena kirî ya rûyên wê.şitla

nêrgiza.wê bejna bilind.

Serinca wî kêşa,û hizra bire roja êkê ya zankoyê.demê ew pirça reş,ew çavên belek,ew

bejna sipîndarî dîtî.gelek kar kir,heta şîyay bêjitê..

- Sipêde baş.

Bidû çavên şermîn,bersiveka pirî hîvî da û burî.

Jiwê rojê her roj karê wî nêçîra wan çava û wê pirçê bû.

Şeş heyiv bûrîn heta şîyay çareka dî bîseyekê dirêya wê xezalê da danit û bêjtê:

18

- Sipêde baş

Roj bû rojê ew xezal kehî bû,xwe pitir nêzîk dikir,dişîya lidîwana wê rûnit.Heta şîyay

diderîya çavên wê da Melevanîya bikit.Bihemû vîyana xwe bikevite ditora pirça wê da..!

Dawîya xebata wî,maleka biçûk pêk hat,û nihu babê dû kura ye.lê hemû lipişt xwe hêlan û

bidûv serê xwe ket!

- bibûre,min gûte te sipêde baş..

- ê.. Bibûre sipêde baş!

- Navê min netaşa ye,û yê te?

Destê xwe yê gelek jibefirê sipî tir dirêj kire nik destê wî.ewê diberûka penteronê kaboy da..

Ew destê gerim jiberûka xwe îna der,kire diwî destê nerim û nazik da û blêvên şermîn

bişkurî.

- ez gelek cara te livêrê dibînim.Erê tû kar dikî?

- ez lizankoyê dixwînim!

- gelek başe,lê zimanê wan girane..!

- erê,nihu ez fêrî zimanî dibim!

- tû xelkê kîş welatî?

- bibûre,eve mêtiroya min hat,divêt ez biçim..

- heta dîtineka dî

- heta dîtineka dî

Her roj sipêdê,liwî cihî çend çirkeyeka lihîvîya mêtiroya xwe dima.Dibû gohnêlîya çavên

wan.Gelek cara xuhê destên wan têkda digirtin.gelek çara mêtiroyê dihêlan û diman bû

mêtiroya bidûfira.gelek çara direng diçû zankoyê.

- ez jidil eviro ya bikeyif û bibextim.Hindî vê dinîyayê keyifa min hatî ye.

Eviro tû mêvanê minî,eviro tû hatîye mala min.Te çi divêt bêje?Bixwaze?Jidlê min..Heta

gîyanê min,her tiştê te bivêt ez amade me.....?

- supas,bibûre,min divêt hevalînîya me jituxîbê xwe derne kevit.Bû zanîna te,ez xudan jin û

biçûkim,û min jina xwe û bçûkên xwe jigîyanê xwe xuştir divên.

- bibûre,bibûre,ez te jiwan nastînim!Tinê min divêt xizmeta te bikim,tû yê limala min.Dê çi

xoy....?Dê çi vexoy....?

Min hemû rengên vexwarina hene....!

- bibûre,ez vexwarinên kihulî navexum.

19

- ew çewa?!Da bûte şîrekê biçûka bînim?!

Bi kenîyeka mê qesta jora xwarinê kir.

- erê,bawer bike,ez gelek hez jişîrî dikim,heta ez bûyme zava jî,her roj sipêdê dayika min

şîrê miha dida min.

kenî zêde bû,suhbet belav bûn,seredan berdewam bûn.

- eve sê çar care tû diêye mala min,û her car tû dilê min dihêlî,û çu tişta venaxuy.lê vê carê

tû jidestê min qortal nabî!

Perdaxa votkayê dana ser wê mêza liber sîngê wî,û êk ma didestê wê da.

- Bibûre,ez neşêm vexom!

- Qet nabit,divêt tû vexoy!

- Min çu car venexoarî ye.

- Şerme,xwe vêrbike!

- Bibûre,min ne vexwarîye,û ez xwe vêrnakim!

- Başe..Ez dê bû te hindek bîrê înim?!Bîre vexwarina jinaye!

Perdaxa bîrê jinav herdû memkên xwe îna der û kire didestî da!

Nevîya jê wergirt,lê piştî benduşka memkên xwe verî û ew her dû bilbil nîşa çavên wî dayin!

- jiber xatira van,ewên jidayika min pêve ne dîtîn.ma tû venaxuy?!

Berî lêva perdaxê vemalit,bişkujka memkê xwe kire didevî da.wek biçûkek sava liber sîngê

xwe nivand,her çendekê perdaxek bû dadigirt.

Çu tam jiwê vexwarinê ne dihate devê wî.jibilî tama wan bişkujkên rengê wan jirengê

memka ne gelek cûda.

Liroja dî,hemû tişt jibîrkirin,hemû jivan hêlan,çu nema libîra wî,tinê jivana wan,tinê dîtina

wê!

Her liber dergehî,xwe havêtê û dinav sîngê xwe da givaşt!

Bextê te me,tû dîsan wan memka nîşa min bide!

Were rûne,dê eviro tiştek gelek jimemka xweştir dime te!

Zanko jibîr kir,xwandin nema,hîvîya wî.mala xwe,jina xwe, biçûkên xwe.Hemû gurî

jivanekê,dîtinekê kirin.

Wek sovîyekê tubedar,berî bangê Melay limizkevtê amade dibit,gelek şeva heta berê sipêdê

ligovenda pirça wê serê xwe dixwar.Mala xwe hêla,jina xwe hêla,bû êxsîrê bendşka

memkên wê!

20

Jizankoyê hate derkirin,xanî jê hate standin,polîsa pirsîyara wî dikirin,lihevala berze

bû,hizar telefun jiwelatî bû hatin.

Ageh jiçu nema,tinê ew gûtin bû wî ferman bûn,ewên jiwan lêvên sur derdiketin.Tinê dinîya

diçavên wêra didît.tinê bimejyê wê hizir dikir!

"ewê he,kiça xwe kuştîye,ewê dî,tirîyakçîye,ez qaçaxçî bûm!"

- bibûre Mamusta,hosa bû te naçite serî!Tû dê bû demekê dirîj livêrê mînî,vêca xwe vêrî

jiyana me bike!

Divêt tû digel rûdanê bijî,heker dê dîn û har bî!

- Nene,ez bawerim Mamusta jihindê mazntire,û gelek tiştên hosa biçavê xwe dîtîne,mane

Mamusta?

Kenî tijî jora girtîxanê bû,pist pist zêde bû.

Azad hate ser hişên xwe,lidur xwe zifirî,zanî ka diçi kawdan daye.Zanî ewa biserî hatî ne

xewne!Rastîye,divîya bikite hewar.

Madê kê guh lê bit?Divîya birevit û jidinîyayê hemûyê der kevit,lê dîwarên girtîxanê dasê

ne.gelek lidûr xwe zifirî,gelek tengav bû.

wî tolazê eve demeke çu deng jê naêt.Milê wî kirt û bişkurî:

- Bêhna xwe fireh bike,tengavî didûv kurtin.

Bû cara êkê dilê wî kêmtir xwe qota.Pîçek jibezîna xwe sist kir!

Careka dî wî tulazî destê xwe dana ser milî:

- Navê min Kaweye,ez xelkê Kurdistanê me,eve demeke ez divê jorê ve,peşêmanî tinê fayde

nakit!Divêt mirov mifay jişaşyên xwe werbigirt,û bû xwe bikite aqil,da carekadî toş nebit!

Bestîyê devê wî berda,her wekû jinû fêrî axiftinê dibit.

- bib..Bibûre,tû jiber çi livêrey?

- mala xudê ava,çend axiftinek jidevê tederketin.Em dê gelek axivin,em dê gelek suhbeta

kin,roj û şev didirêjin!

Xwe pitir nêzîkî wî kir,û cihê xwe xweş kir,divîya baş bikêşte nav suhbeta xwe da.

- Bira,ez jî qaçaxçî bûm,min mirov dibirine dewletên dewrû bera.eve welatekê

seyire,penaberyê nadite kesê!

Û nahêlit kes jê derkevit û biçte welatekê dî!

Eve min behsê xwe kir,divêt tûjî bidirêjî behsê xwe bikî,tû kî? Bû çî girtî?Çend sala?Gelek

pirsîyarin.divêt tû bû me bersiv bidî,da bêhna te jî û ya mejî fireh bit.Lê raweste da bû te

çayeka xweş çê bikim,paşî dest pê bike !

Dû sê hevala xwe nêzîkî cihê wî kirin,her wekû mîrzo dê çîroka mem û zîna bû wan bêjit!

21

Zanî jivî deravî dernakevit,heta parzînkê xwe vala nekit,zanî jiwê zifirokê dernakevit,heta ya

didilê xweda bû hindek goha vala nekit,zanî barê wî jişîyanên wî zêde tirin.

Divêt hindek harî wî rakin,zanî ew barê giran,biwî bitinê na ête helgirtin,zanî kulên dilê wî

hosa naêne derkirin,bisanahî derman nabin!

Dû sê cara,wek mîrzoy cihê xwe xweş kir,destên xwe têk husîn,berê xwe da wan serûçavên

dinîva xwe da berize kirîn:

- Hebû,nebû,kes jixudê mazntir nebû,kes jimin direwîn tir nebû!

Kenî tijî jora wan bû,ewên heta wê gavê nehatîne nêzîkî wan,ew jî hatin û cihê xwe girtin û

gohên xwe bel kirin!

Çend çirkeyeka bê dengyê jora wan dagîr kir.

hizirên azadî carekadî wek hestîyê şkestî xwe lêk dan.

gelek tişt libîra min nînin,ez nizanim çi hatîye serê min?

Tinê ez baş dizanim,ez neyê vî cihî me!Eve ne cihê min e,ez çewa hatîme?Ez jî nizanim?!

Kartêkirina heşîş û hêruwîynê hêşta liser gîyanê wî dizal bûn!

Difina wî dixorandin,leşê wî diazirandin.neşîya xwe liser pîya bigirit.

Dihal diçû,gelek çara dikete halê mirinê,derdê wî tinê pileka wê toza jehrê ye derman dikit...

Tijî kun û qolaçên girtîxanê heşîş û hêruwîyne.derdê wî her zû derman kirin!

Hêşta yê libin çavdêrîya dixitora,dilê wî û berxwedana gîyanê wî,hêşta gelek diwesitîyayne!

Gelek denga pêkve gotin:

- Xwe ragire,xwe liber bigire,tû hêşta yê gencî.

Çavên hemûyan man linav çavên wî,ewên bûyine girê û sor bûyin.

Dû sê kesa enîya wî û milên wî perxandin,dile dilê wî didan.

Eve demekê dirêje kesê hosa nazdar ne kirîye.eve demekê dirêje.kesê nedaye bersîngê

xwe.eve demegê dirêje çu sîngên tena hembêz nekirîne!

Dinav destên wanda nivîst.kete xeweka giran.Serê wî danane ser Balîfka wî,lêvên wî tijî

bişkurîn bûn,wek biçûkekê sava,lihêfa wî biser dadan,bibê dengî her êk çû cihê xwe.

demekê dirêj ew jora tijî livîn û deng,bê gîyan ma,her êk dihizirên xwe da xendqî.her êk

dihizirên xwe da çû ber sîngê dayika xwe,xuştivîya xwe.her êk jiwan birista hizirên xwe ve

ma hilawîstî.peşêmanyê dilê hemûyan dixwar!

22

Jor bû gorstan,lê eve ne cihê bê dengyê ye.Seqata dergehî bê dengîya wan,carekadî kire

volkana livîn û dengî.

- Hilûn,demê xwarnê ye..

Şevên dirêj,rojên bê kar,cihê teng,hemû jinihênîya rot kirin. kes nema dû sê cara serhatîya

xwe.jiyana xwe,paşeroja xwe,navê yara xwe,navê dojmnê xwe,dikuçka wanda aşkira

nekirî.kes nema hemû kun û qulaçên jiyana xwe ron ne kirîn!

- Tû dê xwe kule dar kî,dê êşek giran te girit.Ya dilê xwe bêje,serhitîya xwe bêje,dilê xwe

rihet ke.Çu nehêle didilê xwe da.

- Min hemû tiştên xwe firotin û ez hatim,ne paspurte û ne kaxeza karîye.ez mam dikempa

da,neşîyam bizifirim,û ne hatim wergirtin,mirovên min yarî bimin dikirin,digûtin,hindek dû

sê sala piştî te hatîne,nihu xanî û erd û jin û turmbêlên wan tijî Kurdistanê ne!Tû çi dikî?!Ma

tû biwan nînî?!

Ew nizanin ka hindek çi dikin,heta para kum dikin?!

Ew nizanin gelek xudan pare,pîrejna mar dikin!Ew nizanin, gelek xudan pare,karên ne

dirust dikin!Ew nizanin kes bisanahî para kum nakit!Ew nizanin divêt her xûka wan para

bête dan,çi xuşîya mirovî bit,çi ya biçûkên mirovî bit,çi mirov bixwe bit....

Ez jî gelek ture bûm,min gût,dê hindek kara kim.bila dixirab bin,û dê hindek para lêk dim û

dê zifirim.Min nezanî dê serê min jî gurî para bit!

- te çi karên xirab kirin?

- dermanik firotin!Heşîş,hêruwîyin..!

- dermanik?

Êkê dî her zû gut:

- te bikar jî di înan?

Çavên wî zîq bûn,bêhna wî lez kir,rengê nav çavên wî zer bû.

- Belê.. Min bikar dînan.Heta ez jê rizgar buym,ez bûm nîve mirov!

Tirsa azad verevî,bêhna wî pitir fireh bû,cihê xwe xuşkir.

- min hizir dikir,ez bitinê me!Min digût,dê çewa sebra min digirtîxanê ve êt?Min nedizanî

wek kempane!Hemû mirovên bîyanî ne,tijî xelkê me ne,tijî heval û biraderin!

- Erê,erê, liser vê hemûyê ra,xelkê me baştire jixelkên dî, gelek bû xwe û bçûkên xwe

paşerojeka baş bidestve înayne û geleka bineciha xwe liKurdistanê jî danaye, û geleka

livêrê jî ketîne ser rêya dirust,û paşeroja biçûkên xwe misuger kirîne,her gava bizifirine

Kurdistanê,Namînne birsî!

- baş û xirab linav me jî hene..Me çu nekir!Em man bê paşeroj.

23

Kabirayekê bêhn teng neşîya xwe:

- Min çîroka te zanî ba,bila ez mirbam!

Hevalê wî divîya azadî pêve kit

- dîyare çîroka wî jiya me hemûyan seyir tire?!Û divêt em rastîya wê çîrokê bizanin!

Her wekû digel dîwarî diaxivin,axivtina wan nêzîkî guhên wî ne bû.

Serê wî yê dinav her dû destên wî da veşartîye,her wekû hindek dê jinav mila hilkêşin.

Wek pîremêrekê nesax yê dinav cihê xwe da rûniştîye.hizra mejyê wî ron kirîye.

Her duwa ew bê dengîya gîyanê wî şêlandin,û lihzirên wî yên westîyay bûne mêvanên

dargiran.

- Bibûre,me divêt harî te bikin,te jivan hizir û xema dûr kin....!

Serê xwe yê giran jinav destên xwe bizorî îna der.Navçavên wan liber çavên wî,dizer û bê

şînwar bûn.Çu çav çu dev û difna xûya ne dikirin.Herdû jêk cûda nekirin.kes jiwan ne

nîyasî,tinê zanî eve ser û sîmayê dû kesa ye..

- hewe çi divêt?

- me divêt tû jî bêye dinav meda,beşdarîya jiyana me bikî, hosa bûte naçite serî,dê xwe kujî.

Kenîyeka zer lêvên wî yên xav kirêt kirin,lê kuxkê her zû xendqand..

- Hêşta min xwe ne kujtî ye?!

- Ne ne mala te,şolên giran diêne serê zelama.Tû hêşta yê gencî,divêt xwe liber bigirî.

Hevalê wî destê xwe dana ser milî,wek pîremêrekê dan emir:

- lawê min,ewa te kirî,te kir û bûrî.peşêmanî fayde nakit.ya baş ewe tû mifay jiwê xeletyê

werbigirî,jiyana xwe ya may bidirustî bibûrînî.ewa çuy jibîr bike.hemû ya lipşt xwe bihêle,

tinê hizira rojên bêt bike,tinê hizira mala xwe û biçûkên xwe bike,tû dê her derkevî,dê qesta

mala xwe kî.Ma tû dê heta heta digirtîxanê da bî?

Hevalê wi milê dî girt:

- hilû navê xudê bîne,dilê xwe xweş bike,digel me rabe,û rûne,dê roj û şevên te bisanahî

bûrin.

- Heker hûn bela xwe jimin vekin..Heker hûn mayê xwe dimin nekin..Dê jiyana min gelek

xweştir bûrit!

- Em desta jite bernadin,dixitûrê te jî ya gotî.

divêt tû nemînîye bitinê,nabit tû gelek hizira bikî!

24

Çend çirkeyeka bêdengîyê biserda girtin.Hişên wî lêk kum bûn, zanî van hevala tiştek

divêt,û bisanahî bela xwe jivenakin.

-hewe çidivêt?Ez çi bû hewe bêjim da hûn bela xwe jimin ve kin?!

Herdû lihîvîya vê pirsîyarê bûn:

- behsê xwe bike,tû kî?Xelkê kîj bajêrî?Çi kesî?Çewa hatîye girtin?Jiber çi...?

Pirsîyarên wan wek gijloka biharê liser serê wî dibarîn.

bişkurînê lêvin wi yên qeşapî xemilandin.

- Hewe divêt harî min bikin?Yan yarîya bimin bikin?

- Nene,binavê xodê,me jidil divêt harî te bikin...

(10)

- Sipêde baş

- Sipêde baş..Keremke?

- Ez azadim,derçuyê kulîja endazîyarî.Serketîyê êkê liherêmê.

- Ser seran,ser çavan,kerimke..Mamusta lihîvîyate ye, keremke,keremke..

Her liber dergehî,Mamusta jipêşve rabû,destê wî givaşt û da bersîngê xwe:

- Te serê me bilind kirîye,tû hejî her tiştê te bivêt,her cihê te bivêt,keremke rûne.

- Bibûre Mamusta,ez lidûv daxwaznama te hatîme!

- Tû gelek bixêr hatî,ez jî lihîvîya te bûm.Tû dişêy her sube dest bikarê xwe bikî.me bû te

cihekê destnîşan kirîye.hîvîye bidilê te bit.

- Her cihê hebit,ez amademe.min divêt jidil xizmetê bikim, min neşîya pêşmergatîyê

bikim,ez ne gehiştim şoreşê.ez yê biçûk bûm liberxwandinê,lê nihu min divêt wê kêmasîyê

pir bikim,pêşmergatîya xwe biqelemî bikim....!

- Xebat,her xebate,çi biqelemî bit,yan bitivengê!Liher demekî xebat birengekîye,her şoreş û

çekê xwe..

Lidemê şoreşê,geleka xebat kirin,geleka gîyanê xwe kirine qorban.Nihu gelek jiwan kesa

neşên ew xebata tû dikî bikin. Ewan rolê xwe biserferazî bire serî,nihu rolê xwandinê û

zanînêye.Em hemû kardkin jibû vî welatî,da em bişên bigehine karwanê pêşketinê,da em

bişên digel milletên dinîyayê bijîn,û nehêlin dojmin dinav meda serî hildin û hêlînên kehî

avakin..

Û jibîrneke?Ewa bab û bayirên te kirî,naête jibîrkirin...!

- Eve hîvî ûumêda me hemûyane.

25

- hîvî ya serketinê bû te dixwazim dikarê te yê nû da,hîvî dikim ka çewa lizankoyê,yê serketî

bûy,wesa dikarê xweda jî yê serketî bî..

"tû mirovekê gelek zîrekî,

Tû dê bîye kesekê navdar,

Paşerojeka geş ya lipêşîya te..."

(11)

- Ez likîve me?!Bû ez livêrê me?!

Bidengekê tijî kenî û bşkurîn,û diberra karê xwe encam dida:

- Tû yê lixestê,nihu tû gelek yê başî û dîyare tû dê zû sax bî.

- Ji ber çi ez lixestê me?!Çi limin hatîye?!

- Ne ne çu lite nehatîye.Ji ber,jiber,..

- Jiber çi?Ha..?Hîvîye bû min rastyê bêjî?!

- Bibore,nihu dixtor dê êt,tû dişêy her pirsîyara te bivêt jê bikî

- Wesa dîyare,ez gelek yê nesaxim?!

Lewa hewe ez jigirtîxanê înayme xestê....!

- ne,wesa nîne.Nesaxîya te ne ya dijore.tinê jiber wan dermankên te dikêşan.Bisanahî tû

jikartêkirina wan rizivar na bî.taybet tû carekadî digirtîxanê ve dikêşî...!

Divêt tû dibin çavdêrîya dixtora da bimînî.

- Xuzî tinê kartêkirina dermanka ba....

Gelek tişta jiwan dermanka pitir ez êşandîme,ez bawer nakim çu dixtor min jikartêkirina

wan rizgar bikin...!

- Belê..?Te çi gût?

- Çine.. Çine..

Piştî jikarê xwe bidawî hatîn,derketin û dergeh jipiştve kilîl dan.

Dengê kilîlê diserî da hizar hîvî ser jê kirin,hizar xewin berze kirin,hizar kul likulên wî zêde

kirin.dengê kilîlê,hizar cara deng veda,hizar cara jidengê seqata girtîxanê dijoar tir bûn.

26

Zanî divêt baca hemû xeletyên xwe bidit.

"tû dê bîye mirovekê navdar,

Paşerojeka gelek baş ya lipêşîya te...."

***

Destê yara wî didestî daye,dinav baxçê zankoyê pîyasa dikin.Dûhî wek vî demî,şahîya

nîşanîya wan bû.Çend heval ûbirader kum bibûn.

- Eviro xuştirîn roja jiyana mine..

- Ne, duhî xuştirîn roja jiyana min bû..

Kenî biser baxçey da bilind bû.Wek dû pelatînka ew baxçe xemilandîye.Yê dikupka xoşîyê

da,kesê jixwe bibext tir nabînit,her ewe ser kêşê jiyanê..

Dengê xodanê karî,hizirên wî sotin.

- subehî ne êye karî,

- ez te ne bînim livara,

- tû bikêr çu kara naêy..

Wek har û dîna rabû ser xwe,wan sonde û sirinca,wek qeyda girêda bûn.ma dicih da,neliv

ma,dixuha xwe ra û dinav hizirên xwe da,çu nemaye dê har bit!

Çu tişt neşên şev û roja rawestînin.Her roj karê xwe dikit û bihemû hêza xwe,qebê şevê

dixwazit,şev şerim nakit,her zû jiber rojê direvit.Lê her zû pîlaneka tarî bû rojê didanit û

dinava pêlên xwe da dinivînit...!

Dujmnatîya şev û rojê,xemên wî digel xwe sist dikin,barê wî sivik dikin.

Ev ware bidilê wîye,kes pirsîyaên girêt jê nakit,kesê nevêt jiberperên jiyana wî ya şêlî çu

nehênîya bizanit.

Bû kesê nexeme ka çi kirîye..?Kes pê na kenit..!Kes dilê wî nahêlit..!Kes dermanka bizorî

naditê..!

Hemû hevalên wî yên vî warî,kiçên ciwan û xwîn şirîn û hestî sivkin.karê xwe bibaştirîn

reng dikin,hemû liber xizmeta wî dirawestîyay ne.

Wan seruçavên şirîn,wan bişkurînên nazidar.gelek jixemên wî verevandîne.Gelek jihîvyên

wî sax kirîne.gelek cara xewnên xoş dibînit.

Tinê dengê girtina wî dergehê lipêş çava bûye berê reş, lihivîya tewafa wî.wek sofîyekê

dîndar.tinê dengê wê kilîla digoha da bûye dengê gullebarana gîyanê wî,dengê sotina

hîvyên wî, dengê girtina dergehê xoşyên wî.

27

Rê liber diête girtin.hemû tişt dimînine bê gîyan,bê livîn, hemû tişt,dimînne lihîvîya vekirina

wî dergehê lipêş çava bûye dergehê mana wî.dergehê jiyan û paşeroja wî...

Dibit rojekê diwi derigehî ra.dayika wî,babê wî,jina wî,digel herdû kura bêne jor.Dergeh

vebibit,û hemû pêkve bêne seredana wî,dibit..Dibit....!

Pençera jora wî,dikefite beramberî baxçekê gelek ciwan, dinav wî baxçey da.rêyeka hatin û

çûna mirova heye.

û hindek textên bêhn vedanê libin wan dara hene.

Çend carekê liber wê pencerê dirawestit.berê wî dikefite wan pêlên mirova,ewên qesta

xestê dikin û didestên wan da,qeftên gula û dîyarîne.car jî digel nesaxên xwe dinav wî

baxçey da,pîyasa dikin,û liser wan texta dibite kenî û sehbeta wan..

Dilê wî diqormçit,dinîya lipêş çava tarî dibit.

Ew bitinê livê cîhanê yê jibîr kirîye,kes nîne bibite mêvanê wî kes naête seredana wî,tinê

ewe yê bê heval,tinê ewe yêbê kes û kar,tinê ewe lihîvîya mirinê...!

Dengê vekirina wî dergehê lipêş çava bûye derkehê welatê wî.

Bêhna wî fireh dikit,tinê ew hîvîya may pê dijît,lê tirsa girtina wî dergehî her,liser hizira wî

ya zale.

Roj bo rojê hizirên wî yên belav?Carekadî kum dibin, vedcemine ser êk,xwîna wî ya şêlî û tjî

Dermanik.roj bo rojê ya zelal dibit,û leşê wî yê lawaz,yê xwe lêk didit û bigîyan dikevit.

Çu nemaye dê ête ser hêza xwe ya caran,çu nemaye dê

jiqeydên dermanka rizgar bit.

Lê hêşta qeydên yasayê didestanda diasê ne.hêşta baca şaşyên xwe bidawî ne daye.hêşta

dengê kuxka wî ya şêlî ye.

Hîvî na mirin,çav lirê na westyên,xudan umêd her lihîvîya dawîya umêdên xwe dimînin.

Destê xwe dana ser milê azad.piştî gelek ew kaxezên didesitî da têkvedayin,piştî dû sê

caran digel sistirên xwe jî axivtî kenîyeka şirîn jilêvên wan dibarî.

- Gelek başe,gelek başe..Min bawer nedikir tû dê hosa bisanahî sax bî.tû nihu yê sax û

dirustî.Pîroz bit,û hîvî darim dijiyana xwe da yê serketî bî..

Destê wî bigermî hejand,tijî nav çavên wî kenî û bişkurîn bûn.

Sistira xwe havête nav sîngê wî da û pîrozbahîya wî kirin. dengê kenîya wan tijî jor bû.

Dilê wî yê pîr carekadî çeq dan.carekadî geş bû,xwîna dilê wî,wek volkanê azirî.

- Supas dixitur,gelek supasîya hewe hemûyan dikim.

- wek ez dizanim demê girtina te jî gelek nemaye?Hîvîye eve dawîya girftaryên te bin!Lê min

divêt bêjim,berî tû jinik me biçî.em dê nav û nîşanên dixitorekê dî dine te,hîvî ye tû

seredana wî bikî.

28

- bibûre, jiber çi dixitor?

- bila bû te hindek taqîkirina bikit,jibû silametîya te.

Berî dixitor derkevit,berê xwe da sistira û gût:

- çu dermanên dî ne dinê,heker eve xilas kirin,birîyara derçûna wî bidin,bila biçite cihê jê

hatî,ez jiêşa wî pişt rast bûm.

Wek kutireka sipî,divîya esmanî hemûyê têkvedit,divîya bikite hewar,divîya bikite girî,divîya

bikite dewat,divîya serê xwe lidîwara bidit.

Demê didanên wî jibin lêva derketîn.hizira bire girtîxanê, ewa lihîvîyaû.

Her çende ew jî kêm ya may,dê jiwê nexoşîyê jî rizgar bit.lê dilê wî her yê bê hîvîye.Dê çi

kit?Dê kîve çit?Dê çewa xwe xudan kit?Neşole û ne cih û ne harîkarî..?!

Dîsan kete dihizra da,dê tuşî nexoşîya û mirovên xirab bit. dê dîsan kefite kulana.dê neçar

bit xeletîya bikit.

Dengê dixiturî hizirên wî cemandin.

- tû yê ji êşa xwe rizgar bûy,hîvî ye dijiyana xwe da yê ser ketî bî û tuşî çu nexoşîya ne bî..!

(12)

Seruberê kempa wî,gelek ji wê girtîxana eve berî çend rojeke jê xilas bûy kembax

tire.Ligirtîxanê hemû tişt dibin kuntirola polîsan da bûn.Xwarin û nivistin û kar kirin.kesê

nedişîya jituxîbê bê lezetîya xwe derkevit.

Livê kempê çu yasa û çu polîs nînin.her kes û bextê xwe û têgehştina xwe.her kes xwe

didanit yasa û dadwer.

Yê razî bit dê jît wek wan divêt.yê nerazî bila bû xwe pirsîyara cadekê bikit!

jora wan ya vê carê,gelek baştire jicarên dî.çar kes û her çar xelkê welatekî.hizirên

wan,zimanê wan,kulturê wan,êke. Ev nêzîkîya gîyanê wan jiyana wan bisanahî dikir,wek

bira û wek êk xêzan diwê jorê da dibûrandin.

Lê jiber tengîya cihî,û bê umêdîya jiyana wan,û bê karîya wan,diêxistine gelek şere devan

da.liser cawazîya hizirên wan,liser cawazîya pila têgehiştina wan,dawîya wan her pêkve

jiyan bû.jineçarî gelek kêmasî liser xwe qebûl dikirin. da jiyana wan biçite serî..

Hemû yên lihîvîya mirinê,mirin tinê dê wan hinêrte welatê wan.

- Heker ez mirim,kelexê min bibine Kurdistanê,min linav van ne veşêrin!

29

- Erê..Eve daxwazîya me hemûya ne.

Kenyê ser jixemên azad stand

- Heker em mirin,jinû kelexê me bibine Kurdistanê?!

- Erê..Bila me dinav van kafira da ne veşêrin.

- Dê malên me çi likelexê me kin?Me bisaxîya xwe çi bû wan nekir,dê kelexê me bû wan çi

kit?Tinê dê xemên wan zêde kit!

- Ne ne,bawer bike, dibit bû demekî bikevne dixema me,lê dê dilê wan pitir rihet bit,û dê me

jibîr kin.

- Ez nizanim em çi dikin?Me çi divêt?Em lihîvîya çi ne?

- Erê ma bû em nazifirin?Welatê me nihu gelek xuşe, avedan û kar û tenahîye.

- Liser xuşîya welatî,vê nexoşîya livan welata,taybet bû me ewên ne hatînewergirtin,mafê çu

kara nebit,çu pê çê nabit,neşêt harî malên xwe bikin.neşên xwe xudan bikin.

- Bira..Nê zifirîn jî me pê çê nabit,ma me çi maye liwelatî? Nexanî û ne kar û ne pare.tijî liser

milên me deyn û qerin, madê çewa zifirin?

- Paşî te livêrê dinîya xirab kir!Nê her bê kar û bê pare û bê hîvî...!

- Erê raste,liwelatî dê digel mirovên xwe jî,û dê beşdarîya jiyana wan kî.Birs û tirs,bila hemû

pêkve bin.Birastî divîya ba, hukmeta me birîyareka baş daba liser vî babetî.

- Erê,divîya ba bû wan kesên dizifirine welatî,hindek harîkarî kirban

Bû nimune,xanî dirust kiriban,kar peyda kiriban..

Kenî tijî jora wan bû,êkî digel kenîya xwe gût:

- her êk û jinek jî bû înaba..

- rastî em yên hatîne şoreşê!Me dinîya bû welatî xirab kir!Da ewjî bû me xanîya û karî peyda

kin?!Me kêm şehîd û aware yên heyin!

Jor bê deng bû,her êk dicihê xwe da,dinav hizirên xwe da, Melevanî dikirin.Her êk

jiwan,hizira liser perên xwe bire welatî,bire dikuşa dayika wî da,bire bersîngê yara wî,jina

wî, bire dinav biçûkên wî da.bire dinav hevala..

Dengê saman,bê dengîya wan şkand

- Me çu nekir,hevalên me her êkî eve sê çar xanî liKurdistanê kirîn,û deh parçên erdî û jin û

her êkî sê çar birayên xwe înane ewropa,jiblî parên hilgirtî liber destê wan.

Dergehê axiftinê vebû,aso cihê xwe xuş kir:

- Erê bawerbike,ewên digel min hatîn,nihu pitir jisê xanîya û deh dikan û hindî te bivêt

parçên erdî,û jina xwe jî îna,nav mala wî jiya serokê vî welatî xoştire.

30

- Bira..Ewa zû pasport wergirtin,û biser karî hilbûn.

- Ne ne,bawerbike,kesê hindî me şol nekirîye.Lê qumar û cîhaza,çu para bû me nahêlin.bila

em dirast gû bin..!

- Qumar..ax bû derdê qumarً ê,kafir fêrî cîhaz û qumarê nebin

Carekadî bê dengîyê hemû ser şorkirin,hemû dinav pêlên xwe da xendqandin.livîn jikesê

nehat,her wekû hemû peyker.

Dişanogerîya jiyanê da,her ekterek lihîvîya rolê xwe ye. hemû lihîvîya derhênerî ne.

ronahî ya kême,deng nîne,ew telefizyuna berî çend roja jiser cadê înayin.hindek cara

dîwarê bê dengîya wan kun dikit,leşê wan dixorand,hizirên wan dimejî da har dikir.Wek

pivdankeka tijî ba,cih nema hizira bikin,çu nemaye dê pivdanka mejiyê wan peqit.

Hizir azirîn,dilî xwe dinav sîngî da dixwar,agir berbû leşî,cih tijî pelên sorin.hemû êxsîrên

zimanê xwe ne,hemûya divêt xwe rûs bikin jigunehên xwe.liberamberî dadwerekê bê dil.da

bidijwartirîn yasa birîyara kunehbarîya wan bidit....!

Hemûya divîya wê bomba jehir kirî jidilê xwe û mejiyê xwe derbikit!

- Min baştirîn kar hebû,her jiheyva êkê ez hatîm vî welatî. min dest bikarî kir.min kabirayekê

gelek baş nîyasî.û dgel kar kir.ez bûm hemû tişt liser karê wî.bawerîya wî bidirustî bimin

hat.kar hemû kire didestê min da.ez bûm heyî û neyî yê wî. gelek cara biheyva ne dihate

cihê karî.seruberê karê yê karkera.hemû didestê minda bû.

Parên min binîva dilê min didane min.min nedizanî dê çi lipara kim?Gelek cara bû mala xwe

hinartin,xanî kirîn,erd kirîn,zêr bû jina xwe kirîn.turmbêl bû birayê xwe hinartin.

Ez bûm mîrê bê xolam...ne ne min gelek xolam jî hebûn.

Bêhna hevalên wî teng bû:

- ê..?Pa çi lê hat?Ka ew pare?Ka ew xolam?Hemû bûne xewin,yan eve filmê hindîye?

- ne, bawer bikin eve çîroka mine,bêhna xwe fireh bikin da ez hemûyê bû hewe bêjim.

- ma ewa te gûtî ne hemûye?

- ewa min gûtî êk jisedê ye..!

- dê bêje bira, jiserî..Heta dawîyê,ma me çi heye?

- rojekê piştî karî,demê bêhn vedana min,mêvanek bû min hat,em pêkve çûn gerîyanê linav

bajêrî...

Her sê hevalên WÎ pêkve gûtin:

- êê...?

Pitir bisohbeta xwe şahî bû,cihê xwe xoş kir.

31

- em gelek gerîyan.Lidemekî wî kabiray gût:

"da biçine divê gazînoyê ve,qehwekê vexun."

Min jî şirim kir û em çûn jor..

Dîsan hevala neşîya xwe,devê wan beş bû:

- û paşî..?

- çi bêjim..?Tijî jor mirovin,her êk liser cîhazekî yarîya dikit, wesa qerebalxe,dê bêjî

vîstevala yarîyên cîhazaye!

Em jî rûniştin,û me qehwa xwe vexwar.hevalê min dest da markekî û kire diwî cîhazê birex

me ve.

- Ê..?Nebêje ew mark bûne hizar..!

Bawer bikin,ew mark diçend seeteka bûne sê hizar mark.

Wey babû!Ew çewa?!

Hevalekî gût:

- erê,ez bawer dikim.Her kesê jinwî xwe fêrî wan cîhaza bikit, ew dizanin ev kese yê nûye,û

wî tema dikin,da her bêt,da bawerîya wî bêt,da bibite êxsîrê cîhaza.

- ê..?Ka tû bixodê raweste,ka çi lê hat?Ka ew pare kîve çûn?

- erê,jixodê bawer bikin..Eve bû rûreşîya min bû!

Da ez fêrbibim,da ez tema bim.

- ew çewa?Rûreşîya çi?

- erê,rûreşîya min bû.Piştî wê rojê ez her roj piştî karî vêrbûme wan cîhaza,her filsê min hey

û her filsê min kar dikir,êvarî dikire diwan cîhazada,heta ez bûme birayê marî,min xwe jikarî

didizî,min parêt karkera jî lê dan,min deyin kirin.

Dawîyê min kar jî hêla,û ptir jisîhhizar markên xudanê karî û yên hevala ketin ser min,jiblî

ewên min sê çar sala kum kirîn. Dawîya wê ez eve ketîme vê kempê..

Kenîyeka şêlî bê dengîya wan sax kir.

- ez çîroka xwe bêjim!Hûn dê bêjin eve filmê hindîye!Eve çîroka "sindîbade"....!

- bêje,dilê xwe paqij bike.

- Hê hê,dilê min û mejiyê min biaxiftinê paqij nabin.Tinê kujtina min dê min paqij kit...!

- Ne ne,we ne bêje,pare qirêja desta ne,diçin û dên!

- Erê heker biserferazî biçin!Dirêyeka baş da biêne mezaxtin. Ne biqumar û karên pûç da..

- Dê bêje,nê te dilê me heland!

- Ez mazntirîn bikirê turmbêla bûm.bawer bikin,demê min turmbêl dikirîn û dihinartine

Kurdistanê,kesê nedizanî kar bikit,gelek cara min deh bar pêkve dihinartin,û min desthelat

liser hemû bazarî hebû,livêre û liKurdistanê jî.

- paşî?Te çi kir?

- min xanî kirîn,dikan kirîn,erd kirîn,her birayekê xwe paştirîn turmbêl bû hinart..

- bes ne bêje hemû çûn?!

Dû sê cara enîya xwe perxand û bêhneka kûr hilkêşa..

- bawer bikin deh cara hindî wan çûn.

- hey hewar,ma te agir berdayê?!

- kak azad,xwezîya agirî.agir da wan sojit,ewên liber agirî.lê evî hemû sotin,ewên liber û yên

dûr,hindî wan deyn jî ketin ser milê min û yên mala me..

- çewa?Çewa? Ka hêdî hêdî bêje da ez bawer bikim!

- Firankfort,heçyê firankfort ne dîtî,ewî çu dinîya ne dîtîye!

- Erê,erê, min gûh lê bûye.Ma tû çûye Firankfortó çi?

- pare,pare mirovî dibine hemû ciha,taybet heker mirov yê bê mejî bit.

- kê tû birîye wêrê?Tû çewa fêr bûy?

- Dê rawestin.Bila ew çîroka xwe hemûyê bêjit.

rojekê min deh turmbêl bitelefunê lifirankfort kirîn,ez çûm dabarkim,piştî min parên

xudana dayin,kabirayekî her xelkê welatêye.Gûte min mala te,te xwe bikarîve kuşt,kar xilas

na bit,were da ev şeve te mêvan bikim,da tû dinîyayê jibîr bikî, dinîya ne tinê kare..!

Xudê mala wî wêran bikit,ka çewa mala min wêran kir.

Ez jî gelek yê westîyay bûm,min gût da ev şeve bêhna xwe vedem,û dê sobe zifirim cihê

xwe!

- ê?Bira bêje?

- bira,piştî xwarneka baş,em çûn cihê qumar û yarîya. Dinîyayeka cûda ye,her tiştê pûç

lidinîyayê,yê liwêrê.

Hemû rengên qumar û cîhaza,xwarin û vexwarin,jin û pûçatî....!

- te dest biçi kir?Jina..?Yan qumarê?!

- min her ageh jijin û jiyanê nema.Min dest da cîhaza wek hevalê xwe,wî çi dikir,min jî wek

wî dikir,heta berê sipêdê. Bawer bikin,min pitir jipêniç hizar marka pûç kirin..

33

- pêniç hizar mark?!Ma te çewa pûç kirin?Tû çewa xisaret bûy?!

- erê pêniç hizar.hemû min lirolêtê dan,rolêt,ewê mala min xirab kir,ewê bivêt mala xwe

xirab bikit,bila rolêtê bikit....!

- Û paşî?

- Paşî,her roja dî min ew tormbêl careka dî linîvarê zifirandin, û bixisaretî firotin,û şev lidûf

şevê,heta bihayê panzîna tormbêla min jî nemay.Min dest da deyna,êdî kesê deyn jî nedan

min,ew rolêt bû xwîndara min,min sûnd xwar,heta ez tola xwe lê venekim,ez bela xwe jê

venekim!

- Bêje,bêje,ya te jiya hemûya xoştire.

- Birayên min,telefun kirin,gûtin ka tormbêlên te?Em yên lihîvîya wan?

Min gûtê hindek para bû min bihnêrin.MinGelek turmbêl kirîne û hemû dinû û giranin.

- û jidirew? Mane?

- Erê jidirew..

- Ê?Pare hinartin?

- Pitir jised hizar dulara hinartin.

Her sê rabûne ser textên xwe,û pêkve

- te çi lê kirin?!

Tirsîya êkser bersiva wan bidit..

- bêje te çi lê kirin?Ne bêjî,ewjî çûn..!

- her ne gehiştine destê min.

- pa çi lê hatin?Hatine girtin?

- Xûdanên deyna birin.

- raweste,raweste,ma çend deyn liser tebûn?!

- Gelek, gelek..Pitir jised û bîsit hizara.

- Mal mîrat,mate çi lê kirin?Ma kes nebû te bikujit?

- Bela xwe jê vekin.Ez derdê wî baş dizanim,ew agirê mala wî sotî,her ew agire mala min jî

sotî..

Vêca ewa hatîye serê wî besî wîye.hûn jî barê wî giran nekin..

- Xuzî her ew ban,deyndar her pirsîyara parên xwe dikin, û gelek cara dawa gîyanê min

dikin,û liKurdistanê mala me hemû yên tuş bûyin.xanî firotin,erd firotin,nihu ewjî yên ketîne

bin deynên min.

34

- Bawer bike,çîroka te gelek jiya "Sindîbadî " seyir tire.

ez ne dixema parame.ez dixema pasporta xwe me,ez neşêm bizifirim,ez neşêm sera

biçûkên xwe bidim,ez neşêm kar bikim,ez yê hêlayme hilawîstî.

Piştî demekî kêm dibê dengîya xwe da mayin.

Dû denga pêk ve gûtin:

- û tû?Çîroka te çîye heval azad?Yan bawerîya te bime naêt?Husa bû te na çite serî,me

hemûya turkên xwe vala kirin,tû yê may.

wî hevalê wê gavê çîroka xwe digût,tila xwe dirêj kire dergehî û gût:

- kes jivî dergehî dernakevit,heta çîroka xwe bidrustî bû me ne bêjit.

Her dû hevalên dî dest qotan û gûtin

- Em jî digel birîyara tene?

Azadî cihê xwe xoş kir.

- çîroka min hemû dizanin,kes nemaye guh lê nebûy.

- ne ne,medivêt tû jiserî heta binî bêjî.Hemû tişta,çu nehêlî. jihebû nebû,heta ev gava em

têda dijîn..!

Memo xwe jitextî havête xwar û gût:

- ça..Liser min,ez dê bû hewe çayeka xoş çê kim..

- Hê hê,xozî ya min qumar ba,xozî ya min,cîhaz ban,xozî ya min tinê pare ban..

- Pa..?Ya te çîye?Te çikirîye?

- Dê bêje bira,dilê me ne helîne,me hemûya ya xwe gût,tû jî ya hatîye serê te bêje da dilê te

rihet bit.

- Bela xwe jê vekin,camêrî dê bêjit.

- Ez bawerim dinîya hemû çîroka min dizanit.

- Çîroka te bû çîroka mem û zîna?Kî te dinîyast?Kê ageh jite heye?

- erê raste,em hindekê jê dizanin,lê bara pitir em nizanin.

Memo çavê xwe lihevala neqand,da bes axiftina wî bibirin.

- Dê bû me bêje..Piştî hevala te tû hêlay,te çi kir?Çi hate serê te?Tû kîve çûy?

- erê herê,te hevalek jî hebû?Berî hemû tişta,behsê hevala

Xwe bike. Ya çewa bû?Ya çiwan bû?Ya biçûk bû?Xelkê çi welat bû?

- Hûn nahêlin camêrî behsê xwe bikit.Bela xwe jê vekin,wî çewa divêt,bila wesa biaxivit.

- Jê bigere,bila ewjî bû xwe yarîya bimin bikin,ew diheqin.

- Em yarîya bite nakin,ma em gelek jite baştirin,heta em yarîya bite bikin?

- Ev şeve,şeva danpêdanê ye,eve şeva rûs kirina mejiya ne, eve şeva ladana hemû

perdane.Bextê teda,tû jî ya hatîye serê te bêje,da em hemû lipêş çavên êk wek bira bin,da

kes jime lomey kesê nekit,da çu nemînte veşartî,da em tûşî çu nexoşyên dî ne bin.

Hemûya pêk ve xwe jitextên xwe havêtine xwar,û liser

textê wî rûniştin,û bû hîvî û daxwaza wan.

Serê xwe bilind kir,berê xwe da nav çavên hevala,ewên rengê jidestdana hemû tişta lê

xweya..!

- Çîroka min gelek dirêje,ne bişev,û ne biroj,xilas na bit.

- Eha wesa başe,heta em dimirim,em dê livêrê bin,û tû çîroka xwe bêje,ewê mir,eve ew ji

xoşîya gohdaryê bê bar bû..

Kenyê ew enyên girê û ew hizirên aloz vekirin.

Dengê qorîyê çayê û bêhna wê biser jora wan ket.

- eve ça jî dirust bû,dê vêca Pêda here..

- birayinû..Piştî ez jipara xilas bûyim,piştî ez jikarî xilas bûyim, piştî min zanko hêlay,min

mala xwe hêlay.Piştî çu jimin ne hatî,piştî ez bû polîsa dîyar bûyim,piştî neşîyay çu kara

bimin bikit.linîv şevekê hate jor,kabirayekê dî digel bû,bisanahî gûte min:

- jieviro û pêve ne êye vêrê,hilû cihê te livêrê ne ma,bû xwe pirsîyara cihekê dî bike..

Hindî min hîvî kirin,hindî min xwe havêt ber pîya,razî nebû. Min divîya tinê wê şevê

bimînim,sipêdê biçim,lê wê şevê ez havêtim pişta derî.

Jor bê deng bû,her wekû kes liwê jorê ne!

Dengê fira çayê jigewirîya êkî hat,hizirên hevalên wî kum kirin.

- ê...? Û paşî?

Serê wî yê şor bû,jigiranîya hizira,neşîya hilgirt..

- Ne ne,rawestin.eve ne serê suhbetê ye,ji serî vêra here.

- bela xwe jê veke,ewa dî em hemû dizanin.

- ez ketim kulana,bê cih û bê pare,û bê kaxez,û nesax û vêrî dermanik û vexwarina...

- tû likîve dinivisitî?Xwarin?Vexwarin?

- likulana..Liber derê dêra,dikabînên telefona da.Û xwarin jî tijî hemû selkên gilêşîye..

36

- selkên gilêşî?!

- erê..Heker mirov birsî bû..Heker zik vala bû..Çu pirsîyara nakit,jibilî têrkirina xwe...!

- ê..?

Paşî ez tûşî hindek hevalên dî bûm,wan jî ez didame şolî.

- Şolê çi?Ma tû ne yê nîve mirov bûy?

- Ewan mirovên nîve mirov divên.her kesê dirust bit,harî wan nakit.

- Ew çi şole wesa?Te çi şol dikir?

- Madê çi bit.Firotina dermanka,peydakirina kesên nû,înan û birina dermanka,û her tiştê

wan divîya...

- Dîyare parekê baş didane te?!

- Parê çi,halê çi.Heker parên paş dane min,ez dê piştî demekî wan hêlim.Tinê nan û zik û

hindek dermanik jibû pêtivîya min..!

- Û bes?!

- Erê.. Û bes.

- Ê? Û paşî te çi kir?

- Ez wesa Mam,heta ez hatîm girtin,û yadî hûn dizanin..

- Bibore bira,wek ez dizanim tû kesekê xwandeva û gelek baş bûy,tû xudan şîyan û pare

bûy.Te çewa gohê xwe da kiçeka wesa?Te çewa xwe bû wê kire erd û benî?!

- Her kesê lichê min ba,da tûş bit.

- Ji ber çi..?

- Ji ber ciwanîya wê,jiber peyvên wê,jiber çavên wê, jiber rêveçûna wê..

- Erê..Bila te hind xwe nekrba didesta da,bila te jî yaryên xwe pê kiriban û hêla ba.

- kes nizanit dê çewa tûş bit,kes xwe liber leşê wê Nagirt. Dema xwe rûs dikir.ez jihemû

hizira rûs dikirim,dinîya hemû jibîra min dibir,min çu tişt ne didîtin,min tama çu tişta ne

dikir.tinê ew leş lipêş çavên min dibû,perstgeh.tinê tama lêvên wê didevê min da tam

dida.Ez diketim,xilwê,ez jihizira dihatim şûyştin.ez jihesta dihatim mêtin.ez dihal diçûm.

dibûme derwêşekê dîndar.

- paşe ma te ne dizanî ew dermanik dê te toş kin?Te çewa hêla?Te bû xwe fêrkir?

- Bira,ne wesa ye,wê birêya cigara û vexwarina dida min, min ne dizanî ez çi vedixom.Min

tama wan ne dizanî,tinê tama lêvên wê,tinê tama bişkuşkên memkên wê didevê min da

bûn....!

- Dikirine dinav cigara û vexwarinê da....?!

37

- Erê..Erê ma ez yê dîn bûm,êkser vexom?Ez kartêkirina wan baş dizanim.

- Û hosa tû vêr bûy?

- Ez vêrbûm,min daxwaz jê dikir,min hîvî jê dikirin,heta hindek daba min.ew jî liberamberî

karekî min bû kiriba.min neşîya xwe liser pîya bigirim,xwîna min hemû bû dermanik.

- Başe,pirsîyareka dî birayê hêja?!

- Keremke..Belê hîvîye yarîya bimin ne kin..!

- Ne,ez yarîya bite nakim.Bawer bike,tû birayekê gelek xoştivî liber dilê min!

- ê..?Te çi pirsîyar hebû?

- Merema wê çi bû?Bû tû fêrî van tişta kirî?

- Gelek merem hebûn.

- Wek çi?Ez tênagehim?!

- Peyda kirina bikirên nû,peyda kirina para û xûdan para

, berfireh kirina bazara.Dibit ew jî tûşî hindekên ji xwe mazntir bibit..?Da şolên xwe

bihevalên nû bikit..!

- Şola..?Çi şol pê dikirin?

- Heker mirov tûş bû!Dê bite kerê wan.Gelek cara dê barê wî kine dermanik û çek û pare..Û

dê bû hevalên wan bine cihê wan divêt,polîs jî wan hêşta nanîyasin.Heta ew jî bêne

nîyasîn,yan girtin,dê pirsîyara hidekên dî kin..

- erê bû ew naêne girtin?

- kes wan nanîyast!Kes wan na bînit!Kes nizanit ew kîne? Ewên berçav baş nizanin xwe

biparêzin.Dibit ew jî diêne berzekirin,ez nizanim?Min divîya careka dî hevala xwe bibînim,lê

wesa dîyare livî welatî nehêlaye.Anku ew jî wek min ya bûye qorbanî!

- Erê herê..Ez jinû têgehiştim!Karên xwe bimirovî dikin?!

- Pa jixwe ne libejna me aşiq dibin?

Dîsan her wekû perda şanoyê hatîye girtin,jor bê deng bû, xewê xwe biser jora wanda

girt.devê hindeka tijî bawşik bûn,her êk ma lihîvîya hevalê xwe,ka dê çi bêjit?Ka dê kî

hindek jijiyana xwe bû wan bêjit?

Hevalê wî nevîya azad binivit berî bizanit ka çi ditûrkê wî da maye?

Û nuke kak azad?Te çi kir bû mala xwe?Te çi libere?Dê çi kî?

Ev pirsîyare,wek tîra dilê wî kun dikin,leşê wî dikine serrad. nevêt kes van pirsîyara jê

bikit,nevêt ew van pirsîyara jixwe bikit.yê lihîvîya mirinê,da jihemû pirsîyar û bersiva rizgar

bit.

- Min mal ya jibîr kirî..Ez bawerim,wan jî ez yê jibîr kirîm!

38

- Bawer neke,mirov naêne jibîr kirin.nihu wek har û dîna lihîvîya tene.lihîvîya her tiştekî jite

bizanin.eve demeke tû yê berze û bê seruşwîn.Hosa nemîne,madem nihu tû yê başî û jiwan

dermanka rizgar bûy.Bizûtirîn dem peyamekê bigehîne mala xwe,da ew jî bes diezaba teda

bijîn.

Hevalên dî jî gazinde jê kirin.

- ez jî pitir jidû sala jimal bê xeber bûm,lê wesa nabit,divêt her tiştekî jimirovî bizanin,çi baş

çi xirab.

- madê biçi rû xwe bû wan dîyar kim?Dê çi bêjime wan?Dê çewa bersiva pirsîyarên wan

dim?

- Ew hemû negiringe!Xema wan tişta nexwe,tinê ew bizanin tû yê saxî,tû likîvey..Ew dê

pirsîyara te kin.Ew tinê bû wan bese.Ewa dî tiştek bû û çû.Kes neşêt bizivirînit...!

"- tû dê bî ye kesekê nav dar,

- te şîyanên mezin hene,

- te serê me bilind kir..."

Dinav hizirên xwe da xendqî,berze bû,gelek jiwê jor ê dûr ket.Jor her ya bê deng dibit,xew

ya har dibit,her ew yê dûr dikevit,dinaf pêlên hizirada kete dizifirokeka har..

Xew jihzira dijwartire,mejyê wî yê westîyay dizî.Liser wî Balîfkê sar nivand...

Kuntirola turka,wek mejyê wan yê dijware.alûze,bizorî derbas bû beref Kurdistanê.

Nevîya biturmbêla teksyê litûxîbî derbas bit.Çantê xwe limlê xwe kir,û liser pirê lihndav

xabûrî da rê.Xabûr yê har bûy,yê dar û bera liber lêvên xwe tîvil dikit.pêlên wî wek şerê

efirta, haha dê wê pirê digel wan dar û bera dauûrit.

Her beref welatî diçit,her dinîya lipêş çava ron dibit.Jidûr, dengê dehol û zirnayê dihate

goha.Her lez dikit,her deng zêde dibit,ew lirxê turka û dayika wî,babê wî,xûşkên wî, jina wî

digel her dû kura û hemû gundîya lirxê dî...

Ew bezî..Gondî bezîn..Dehol û zirna bilind bûn,tilîlî û kenî bilind bûn,dengê mîrzo bilind

bû.lewendyên kiçên gondî bilind bûn.

Wek "marasona" xardanê,hemû têkel bûn,û beref tuxîbî hatin.

Ew lirixê dî yê bihemû hêza xwe rê dibirt,û beref kuma wan diçit.

Jidûr çavê wî biherdû kurên wî ket.kur dinav kuma mirova da,wek dû qeftên nêrgza dinav

destên jina wî da û ya dibezin beref wî diên.

Ew bezî..Ew bezîn,wî kire xar,wan kire xar, linîva pirê,liser lêva tuxîbî gehiştin êk.Hêşta

hirêna pêlên xabûrî goha disimtin. Hêşta dehol û zirna dişarîyay bûn,hêşta mîrzo heyrana

xwe bidawî ne îna bû,hêşta tilîlyên dayika wî liesmana difirîn, hêşta her dû kurên wî

didestên dayika xwe da dibezîn.

Berî xwe pavête ber sîngê babê xwe,berî dayika wî bisîngê xwe ve bişidînit,berî muxtar

silav kitê,berî tewîka mîrzo bidawî bêt,berî sîngê xwe yê sar bû herdû kurên xwe bikite kêl.

Hemû wek tîpeka hunerî liser pirê rawestîyan,hemû man lihîvîya wan pêlên har yên xabûrî.

Xabûr yê har bûy,agir yê jipêlên wî dipeşit,lêvên pirê digel xwe birin,pir bû dû pirt.hemû

jorda beref nav pêla çûne xwar..

Mîrzo bê deng bû,dayik û babên wî avê birin,tilîlyên kiça bûne hewar û qêrî digel pêlên avê

jorda çûne xwar.kes nema lipêş çava.

Tinê kurê wî yê biçûk,ewê hêşta ne dîtî.yê bilêva berekî ve maye hilawîstî,lihndav wan pêlên

har..

Har bû,dîn bû,hindî kire hewar,çu deng jiber nehat,divîya wek kutireka sipî bifirt,çeng

nebûn,çu jê nehat,çu pê çê nebû,neşîya wesa xwe bigirt.

Destê kurê xwe girt û hilkêşa nik xwe ve.Ew pirta berî,ewa libin pîya,sist bû,jicih çû,digel

kurê xwe beref pêlên xabûrê har çûne xwarê..

Hindî dilê wî yê jar bizav kir,hindî hîvyên wî daviz bûn,jihemû hêz û şîyana xwe kire hewar.

Rast rabû ser xwe,serê wî bibanê textê diser wî da ket,ageh jixwe bû,heval hemû jixew

hişîyar kirin.....!

(13)

- Min birîyara xwe da,ez dê çime jiderve...!

Jor bê deng bû,her wekû wî biçûkê sava jî hest kirî tiştek ne dirêda hate gûtin.Ew jî bê deng

ma!

Wê baş merema wî zanî,wê zanî behsê hewşê nakit,wê zanî behsê kulana nakit,wê zanî

naçite çayxa û meyxana.Wê zanî heker ev birîyare bicih hat,eve dawîya xoşyên wê ye. Eve

mala wê kavil bû....

Xwe tênegehand:

- Vê nîv şevê?!Dê çi kî jiderve?

Çend yê bê zewiq bû,pitir lê hat.Enîya wî bû girê,zanî ew xwe tênagehînit,zanî ewê nevêt

rastîya axivtina wî bizanit, zanî ew baş dimerema wî gehişt,lê xwe xişîm dikit.

Berê xwe da nav çavên wê yên mijûl birapêçana cilkên biçûkê xwe.

- tû yarîya bidemarên min dikî?!

Serê xwe jinav wan pata îna der,zanî neşêt pitir xwe mijûl bikit,zanî divêt liberamberî wî

rawestit,zanî revîn ne çareye.

- Yarîn çi dilê min?Mate çi gût?

40

- Min gût,ez dê çime ji derve..!

- Jiderva kulanê?Yan ewa çûn û ne zifirînê?!

- Ewa çûn û zifirînê,ewa bihayê mirovî baş dizanin,ewa dikupika pêşketinê da,ewa gehiştîn

ser banê stêra...Te zanî yan bikime hewar....?

Rengê wê vêçarê bidirustî hate gihorîn.Zer bû,sipî bû, tezîlanik biser leşê wê da çûne

xwar,hişik bû,axivtin jê nehat.

Jor bû gorstan,ronahî lipêş çava şêlî bûn.Ew dîwarên biwênên xwe û yên kurê xwe

nexşandîn,pîç pîçe dihatine êk.her nêzîkî êk dibûn,çu nema bû da dinav wan dîwara da

perçiqin.

Girîya biçûkî jiwê tengavyê rizivar kirin.

- Te çi goh lê bûye?Kê dilê te hêlaye?Çi jite kêm?Te divêt mala xwe bidestên xwe xirab

bikî?!

- Eve birîyara mine,eve paşeroja mine.Kesê mav nîne razî bit yan ne!Dê bû mala min xirab

bit?!

- Jiyana te jiyana mine,paşeroja te her ya mi e,min wek te mav li ser te heye,tû baş dizanî

eve ne karê teye,çi jite kême ?Dê jiber çi çî?Te çi divêt?Baştirîn kar yê teye.hemû biserê te

sund dixûn.

- Hê hê,tû êkê dizanî û ez êkê..!

- Tû çi dizanî?Çi tiştê nû liser karê te rû daye?

- Kiçê livêrê paşeroj nîne.min divêt xwandina bilind bixwînim "master...Diktura..."

- Ma livêrê nînin?

- Ne,heker hebin jî ne wek li ewropa ye.Ewên gehiştîne pileyeka bilind ya zanistê.

- Û em..?Dê çi lime kî?Em dê çewa jîn?

- Hemû çend heyvekin,ez dê hewe jî înime nik xwe,û em dê pêkve jîn.

- Babê te?Dayika te?Mirovên me?Ewê diçavên tera hizar hîvî didîtin?Ma dê vî welatî

hemûyê digel xwe bî?!

- Mala te,hemû çend salekin û em dê zifirin.

- Başe, kî dibêjit dê te wergirin?Kî dibêjit tû jî wek geleka nakevîye kempa û rezîl bî?!

- Ne ne,min têra xwe berdest hene,ez pê biême wergirtin û libaştirîn zanko bixwînim.

Çi bizimara wê qûta,wî çantek pêve kir.Çu axivtin neman berevanîya xwe bikit.Jor bê deng

bû,herdû bê kîyan man...!

Ew germa dijora wanve,bû serma,leşê wî yê lawaz gezand.

41

Seyê pîrejinekê hizirên wî bin ax kirin,cih gûhart seruber kire rastî.

Liwêve hindek biçûka yarî bibelgên dara dikirin.Liser wê textê hercar bêhna xwe

vedidit.kiçeka sinêle ya romanekê dixwînit.

Dengê livîna mirova,berdewamyê didite jiyanê,roj bû rojê yê hizir û hestên xwe

dicemînit.roj bû rojê yê ligîyanê xwe dibite xudan.

Dizanit ka çi hatîye serî.dizanit husa bû wî na çite serî.Divêt hişîyar bit,divêt bizifirte rigê

xwe.

Kuxî,gelek kuxî..Tifa wî didevî da tama xwînê jê dihat.

nevîya biçavên xwe wê xwînê bibînit.çavên xwe niqandin û tif kire wê zembîlka gilêşî.

- ev kuxke neya diruste!Her ya dijwar dibit!

Gûtinên dixitûrî diserda deng vedidan:

- piştî tû jivêrê xilas dibî,herevî dixitûrî.Bila bûte hindek taqîkirina bikin,jibû silametîya

te..Tû gelek yê nesaxî,divêt tû baş pirsîyara xwe bikî,û libin çavdêrîya dixitûra dabî....!

- nesaxî jimin kême..!Heta ez jinesaxîya dermanka rizgar buym,tûşî êka dî bûm..!

Ew rêya dinav wî baxçê mezinda.da bersîngê xwe,hizra jitûxîbê wê baxçê bire der,ageh

jidengê wan tulaza nema, ewên yarîya dinav wî gîyayê ter da dikin,ageh jikenîya wan kiça

nema.ewên dikuşa yarên xwe da liwê êvare zûyê gohnêlyê dikin.hizira bire çîhana xwe.Tinê

leşê wî yê may, hizir û gîyan bûne pelatînik û firîn nav baxça biçûka,dinîva hewşa

wanda,dada ser gulekê.Berî hemûya herdû kurên wî bikenîyeka şirîn qest kirine wê

pelatînkê.

wî gût bû mine,yê dî gût bû mine.Lihindav serê wî bû şerê herduwa,seruçavên êk dane ber

nînuk û tep û mstan. Dayika wan litana wan hat.wê jî kire hewar û gût:

- ev pelatînke bû mine.

Biçûk lê kirîn,wê xwe asê kir,bapîr û dapîr litana wan hatin. Ew jî sera wê pelatînkê lêk

ketin.her êkê divîya bû xwe bibit.

Xûşik û bira hatin,her kesê jimala wan hatî,her kesê ew pelatînik dîtî,bû xwe divîya û şer

liser dikir.

Hemû ketin nav êk,wekû şerê qereça.Kesê nezanî hevdijê wî kîye.Tinê daxwaza hemûya

pelatînke!

Berî kes destê xwe pavêtê û bû xwe bibit.

Lipşt wî dengê rawestîyana payskilê tûlazekî hate gûha digel hindek xebera..

- beraz,ma tû yê kurey....?

Hate ser hişên xwe,leşê wî tijî serma bû,recfikê girt,beref kempa xwe zifirî.

42

- heker ez beraz ne bam?Heker ez kure ne bam?Min mala xwe,welatê xwe ne dihêlan û ned

hatime ber difina te?!

Lipişt wî dinîya gewir bû,ronahîya gilopa şer digel tariîyê dikir kitkte xelkî qesta malên xwe

dikirin.cade tijî jiyan û livîne.

Dipencerên wan malên liber lêva rê,sînahîya mirova didît. lidûr xwarinê,telefizywnê

dikumin.kenîya wan jiyan jê diza.

Liberahîya wî,tulazekî destê jina xwe girtîye,dû biçûk û seyek wek pelatînka lidûrên wan

yarîya dikin.hemû pêkve beref mal diçin.her çendekê dayik ya dibêjte wan:

- lezê bikin,da biçine mal.

Biçûk jiyarîya têrna bin.

- ne,em naêne mal,medivêt hêşta yarîya bikin..

Bab digel sey direwî,wek pişîka dinewî,xwe dikire ker û Dierî xwe dikire bilbil û xwe dikire

kutir û lidûr biçûkên xwe difirî.

Berî wan direvî,lipişt wan dizifirî,xwe berdida axê,her dû biçûk diçûne ser pişta wî,sey xwe

dihavête dinav kuma wan da.kenîya wan biser hemû dinîyayê diket.dayika wan xwe

dihavête kuma wan,pêkve dibûne kevalekê keyivê..

Lipişt xwe hêlan diwê xoşîyê da.hind dît yê liber derê jora xwe liwê kempa lipêş çavên wî

bûye zîndan rawestîya, heval yê pê dikenin..

- dîsan hizira tû kîve birî?

- ma tû birsî nabî?

ma tû na wastyêy?

Hate ser hişên xwe,serê xwe bilind kir

- Min hizir yên mayin..Hewe divêt ez wan jî jidest bidim?!

Memo zanî barê wî gelek girane,dibit hizir hindekê jê sivik bikin.

- hizir nîşana saxlemîya mejiye.lê bila ne bite nesaxî,hîvîye pitir barê te giran ne kit.gelek

cara hizir kirina zêde dibite nexuşî...!

Bikenîyeka sivik û bişkurîneka pêtî.

- eha ew ya jimin kême!Ez yê kêm nexuşî me!Bila hizir jî bû min bibine êş û limin zêde bin..!

Hevala pêk ve gûtin:

-Çi êş lite ne kak azad?Tû jime hemûya saxlem tirî,yan tû xwe nazidar dikî?

- Nazdarkirin...Hê hê

43

Bikenîyeka bilind vê carê jikûratîya dilê wî derket.destê xwe wek mîrzo da ber gohê xwe

qêrkirê

- Hey lû.. Hey lûû....Lawikê gondî..

Kenî tijî jora wan bû,lidûr azad kum bûn û beref wê mêza xwarin liser çûn.

Digêleşûka jiyanê da berze bûn…

(14)

- Te xêre tû nanivî?

- Pirsîyareka bê meineye.ez bişev nanivim,dê çewa vê nîvroyê xewa min êt?!

- Çi bûye?Bû xewa te naêt?

- Rast?tû nzanî çi bûye?

- Ne!ez nizanim çi bûye?!

- Hema diwî halî da be,ew hal bû te û ewên wek te hizar cara pîroz bit.

- Halê çi?Te ez tirsandim?!

- Em yên hatîn binivin,Mane?!

- Hû.. Hû.. Dîsa çû wî cihî "ker lê ketî."

- Ew cihê ker lê ketî,çucar ker jibîr nakit,lê heta em nekevne beramberî gîyanê xwe,em

rastîya jiyana xwe jişaşîya cûda nakin.

- Rastîya çi?Şaşîya çi?Mame hindek jiyan maye?!

- Erê,hindî em disax bin,divêt em pirsîyara xwe û paşeroja xwe bikin.

- Paşe roj..?Ev peyve min ya jibîr kirî.

- Paşe roj ne peyve,paşeroj xebate,kare,pilanin,xwe wastandin,xwe libergirtine.

- Erê pirofîsur..Em çi bikin da tû razî bî?

- Ez ne pirofîsurim,û tû ne dê bû razî bûna min kar kî.Te mala hey,te jina hey,te biçûkyên

heyin.welate kê hey.

Divêt bû wan xwe biwastînî,û xebatê bikî,jibû paşeroja wan.

- Biçi hêz?Biçi şîyan?Biçi hîvî û umêd?Biçi gîyan?

44

- Bigîyanê şoreşgêran,bigîyanê xwe gorî kirinê..!

- Jinû min jidil bawer kir,tû yê jikartêkirina wan dermanka rizgar bûy,û tû Mamusta azadê

caranî...!

- Ne ne,hêşta gelek ya may,heta bibime azadê berê.

- û tû?Te çi libere?

- Ez bişev û roj yê hizra dikim,bişev û roj lêgerîyanê dikim,da biser rêyekê helbim,carekadî

peywendiyê bimala xwe bikim.

- Ê..?Te tiştek bidest xweve îna?

- Erê..Ez digel hindek mirovên me axivtim,wan peyam gehande birayê min û jina min.

- Eve gelek başe,hîvî ye zû telefuna te bikin.

Bê dengyê jor dagîr kir..Hizira her dû dauran..

- dîyare min gelek dilê wan êşandîye,lewa bersiva min hêşta ne dayine..!

- bê hîvî nebe!Te nihu digote min,divêt mirov yê şoreşgêr bit û niza çi û çi..?Tû baş dizanî

telefun çend bizehmetn....!

- birastî em ne hejî peyva şorşgêrin.

- bû?Ma em jî ne mirovin?

- belê,em mirovin,lê ma çend mirov licîhanê şoreşgêrin?

şoreş ne tinê çekdarîye,ne tinê berhingarîya dûjmnaye..!

- ez tê nagehim.Bû min wek têgehiştina min ron bike.

- gelek jime şoreşa çekdarî kirin,xwe gurî welatê xwe kirin, derbederî,enfal,kêmîya

baran,kuştina tevayî.Lê demê şoreş bûye xudan birîyar û dewlet,gelek jime dest jê berdan,

jiqada xebatê revîn.

- erê bira,nê gelek jime çu pê çê ne bû,neşîyan gihorîna bikin,neşîyan şaşîya bibînin û bê

deng bin!

- erê raste, şoreş hêşta ya berdewame,hêşta me gelek maye,em xebatê bû bikin,û şaşî

birevîn û destberdanê çareser nabin,tinê biberamberyê û dijrawestîyanê diêne çareser

kirin.

- birakujiyê rolekê serekî hebû,gelek jigorepana

xebatê dûr ketin.

- dîsan dibêjim,dûr ketin ne çareye.Divêt em dan bişaşyên xwe bidin.Welat pêtivî me bû,û

nihu pitir pêtivî me ye...

- wesa dîyare,tû yê karê zifirînê dikî?!

45

- zifirîn..?Zifirîn peyveke neşêt hemû ramana xwe hilgirt. Bawerbike rojek dê biser meda

êt,ka çewa me qaçaxçî girtin û em revîn.wesa em dê qaçaxçîya girin û zifirin....!

- ka ew roj?Xozî ew roj hatiba,bila roja dawîya jiyê min ba...!

Qotana dergehê jora wan,her dû jizifiroka hizira rizgar kirin.

- Azad,azad telefun.hindek yê pirsîyara te dikin...!

Eve pitir jiçar salaye kesê pirsîyara wî ne kirîye,wek sivorekê zîrek,xwe jitextê xwe havête

xwar,pêxwas û nîv rûs,qesta cihê telefunê kir.

- Helo, helo....?

- Azad,azad eve tûy?!

- Erê ez azadim,tû kî?!

Gelek gîro bû,şev biserda hat,bidûv serê xwe ket.Ew bajêr hemû têkveda,çend filsek

diberûkên wî dabûn,dane bişirînayî û bû hevala înan.Wek birayê zavay bidewat û stiran û

kenî ve hate jor.Eve sê çar salin hosa ne kenîye.eve demekê dirêje wî keyif

nekirîye.seruçavên wî kenî jibîr kirîye. hevalên wî man hêbetî?!

- xudê xêr kit?!Te çi goh lê bûye?Kenî û dewat,Şirînayî?!

Eve dîyare tiştek gelek xweşe?!Neku te careka dî dest bidermanik û meyê kiribit....?!

- ne,ne,ew roj çûn û çu çar naêneve.Tiştek gelek jikartêkirina tirîyakê dijwar tire....!

- Ew çî ye babû?!

Dû sê cara bileyizik lidûr xwe zifirî û bî şeq şeqa tilên wî..

- Mala min telefun kirin..

Hemûya pêkve kirine hewar û kenî.Xwe havêtine nav sîngê wî û bigermî pîrozbahîya wî

kirin..

- tû bixudê?Wela eve tiştek gelek baş bû,mizgînîyeka gelek xweş bû.

- ê?Bêje,hewe çi gût?Kî hatibûn?

- birayê min û jina min û herdû kurên min..

- xudê jiyê wan dirêj bikit,û liber sîngê te mezin bin.

Bê deng bû,rengê wî zer bû,hevalekî zanî hizirên wî jitûxîbê jora wan derketin.

- Xêre..?Ma tiştek bûye?!

- Ha...?Ne,ne..Çi ne bûye.

- Pa te xêre?Bû wesa dûr çûy?

46

- Kurê min daxwaza payskilekî jimin dikir,û digût,tû bû naêye mal?Hevalên min hemûya

payskil û bab yên heyin.Min ne payskile û ne babe...!

Kenî û hêbetyê devê hemûyan tijî kir,lê her zû jora wan bê dengîyê hişik kir..

(15)

Gundî hemû yên lêk kum bûyin.cihê azad yê valaye birex jina wî ve.hindek cara her dû

kurên wî lichê wî dirûnin,lê jiber yarîya,carekadî vala dikin.

Cihê babê wî,birayê wî yê girtî.wek zarvekerekê şareza.rolê babê xwe digêrit,wek wî

rûniştîye û tizbîyên wî her çendekê dibite şeqêna wan.

Muxtar,haha dê jihêbetîyada peqit..!

- Kurê min,tû bixwe digel axiftî?!

Berê xwe da jina wî,her ew pirsîyar ji wê jî kir

- Û tû?Tû digel azadî axiftî?!

Wek babê xwe divîya xwe ragirt,û bersiveka giran bidit,lê jina azadî neşîya xwe û diber

rakir..

- erê muxtar,em digel axivtin,gelek silav lihewe hemûyan kirîne, dest û çavên hewe

hemûyan maç dikit..

- pa likîve bû heta nihu?!

- me neşîya gelek pirsîyara jê bikin,wî digût,ez tûşî belayeka mezin bibûm..!

- Dê kengî zifirt?Ma na ête ve?!

- Belê..Dê zifirt,dê seruberê xwe dirust kit.başî dê

Zifirt..!

Birayê wî dû sê cara tizbyên xwe lêkdan û berê xwe da muxtarî

- Zifirîn neya bisanahîye,wî gelek kar hene,hizar tişt lihîvîya wîne.ma dê çema hemûya hêlit

û bisanahî êt?!

Mîrzo jibê dengîya xwe derket:

47

- eve çar pênc sale likîve bû?Pirsîyara kesê ne dikir.Ew çi kare wesa em hemû jibîra wî

birîn?!

Her kesê jigondîya divîya hizar pirsîyara bikit,hemûya divîya

rastîya vê çîrokê bizanin,lê jina wî tinê divîya digel hizirên xwe bifirit beresmana,biçite

dîwana wî.liber tenişta wî. Gelek cara mejyê wê jitûxîbê gondî derdiket û lirojên zankoyê

dibû mêvan,lê wan her dû biçûkên wê çu xweşî bû hizirên wê ne dihêlan,her çendekê

daxwazek dikirin.car dibû şer û qêryên wan.

Şev û nivîna sar,dilê jar kire mêvanê leşê xwe yê har...

-helo azad,ka tû?

- Helo,ez eve me,ma te ageh jimin nîne?

- Were, tû çi dikî?

- Kîve bêm?Nê ez yê linkte..

- Ka tû?

- Eve,ez lipşt te..

- Herê..?Pa bû em bitelefunê digel te daxivin?!

- Niza?Te telefun ya kirî!Dîyare tû gelek ya jimin xerîb bûy?!

- Ez haha dê dîn û harbim!

Telefun havêt,destê wî girt û kêşa dinav nivîna xwe da..

- Bîra te diêt,lişeva zavatîya te

- Ma kesek heye wê şevê jibîr bikit?!

- Nê zavatîya te,jiya hemûya cûda bû!

- Erê, jiber bûka min jiya hemûya ciwantir bû!

Kenîya wê jinav nivîna wê derket.kenî bilind bû,her dû biçûk jixew hişîyar kirin.

- Libîra te ye?Te digût ez dê ev şeve te xom?

- Nê min tû xwarî..

Kenî her bilind bû..

- Te ez xwarim?Pa eve çî ye nihu dinav destên te da...?!

- Ew parçeka dilê mine..

Wek marên evîndar xwe têk hûsîn,dengê gohnêlîya wê tijî jor bû.kenî bilind bû.axiftin zêde

bû.xew jiher dû biçûka revî.

- Dadê?texêre? Tû digel kê dikenî û daxivî?!

48

- Ha..?Ez digel babê hewe daxivim..Zû binivin..!

- Ka babê me?!

- Eve ye liber sîngê min...!

Balîvik bisîngê xweve şidand û her dida ber maça. dikenîgirîya xwe da dixew çû.

Lirexê dî yê cîhanê,azad dinav nivîna xwe da yê bûye zava.

- Ev şeve ez dê te xûm..!

- Ma te ez bû şevekê bitinê înayme?!

Kenîya wî her sê hevalên wî jixew hişîyar kirin

Lidûr cihê wî kum bûn,zanîn yê didinîyayeka dî da dijît..

- Tû hemû jiyana minî,tû dawîya hîvyên minî..

- Ne,hîvî hêşta gelek yên mayin.

- Min çu hîvî nemayne,piştî ev şeve biser min da bûrî..

- Pa ka master?Ka dikutura?Ka biçûk? Dû kur dû kiç...?

- Ew hemû hîvyên biçûkin,hîvîya mezin ev şeve bû û biçih hat!

Kenî bilind bû,suhbet şarîya,birazava yê bileze.

Balîfk liber sîngê wî şidîyaye.her çendekê didite ber maça û her bisîngê xwe ve dişidînit.

Xew jihevala verevî,heval hemû bûne birazava,man lihîvîya wî.azad dikenîgirîya xwe da

dixew çû..

Sipêdê zû,hersê hevala wek birazavay liber textê wî rawestîyan.

"- Me jinû zavakir..Me jinû zavakir

Kaku azado..Me jinû zavakir..."

Rabûne dewat û leyizukê liber textê wî.

- Xêre..?Hewe çi goh lê bûye?Dê hema bêjin sipêde baş..

Tilîlî û stiran û dewata wan tijî jor bû.

- hizar cara sipêde baş,sersubehîya te pîroz bit,ha,ha,ha...

- Dê min jî têbigehînin,da ez jî dewatê bikim?!

- Zava dewatî nakin,hilû serşo amadeye,zavayê delal..

- Zava..?Serşo..?Hûn dihêcin?Didînin?

49

- Şivêdî tû zava bûy,me filim hemû dît û goh lihemû tişta bû..

- Birastî..?Hewe rastî divêt..?

- Ne hewceye,me hemû biçavên xwe dît û bigohên xwe goh lê bû.

- Her wekû şeva zavatîya min dûbare bûy.Bawer bikin,min qet hest nekir ku xewine,heta

berê sipêdê, hemû tişt berze buyn,bûne xewin.

- Dê hilu,serê xwe bişo,were têşta zavatyê bixo.

willa babû hûn diheqin,birastî ez bibûm zava.

Bikenîve jiser şoyê derkit..

- erê zava tene gote me?Birayê te,jina te,çi digotin?Çi heye liwelatî?Çi bûme dibêjin?

- dixewinê da..?Yan ditelefunê da..?

Kenî tijî jora wan bû..

Paryê nanî jidesta ket,serê xwe bilind kir,bêhneka kûr hilkêşa,hizra gelek dûr bir..

Memo zanî vê pirsîyarê jihestiyê wî girt.

- bibûre kak azad,hîvî ye min çu bîrên ne xweş ne înabne bîra te.Heker te nevêt bêjî,tû

azadî..

- ne,çu tiştên veşartî nînin,lê welat yê bûye biheşt.Em livan kulana wek pepûka dijîn,liber

derê karîtas û dêr û rêxirawên

mirovayetyê.eve ne jiyane em dijîn..

- Welat bû ewên pare û kursîk heyin biheşte,ne bû hejara..!

- Ma xelkê Kurdistanê hemûya pare û kursîk hene?Nihu kar û tenahî peyda bûye.her kesê

zîrek bit,dê şêt xwe xudan kit!

- Û dê hêlin mirov bitenahî bijît....?

- Bû nahêlin...?! Kê ageh jite heye?!

- Ma em jiber çi hatîne vêrê?

- Ji bê omêdî..

- Ne,ez yê bû xweşîya xwe hatîm

- Lê hindek jibirsa..Hindek jitirsa hatîne..

- Û tû? Tû jiber çi hatî kak aso?

- Çîroka min dirêje...Ez yê revîm jiber şerê birakujyê.min neşîya xwe xudan kim,û nevîya

birayê xwe bikujim.Revîn tinê çare bû..

50

Kenî ya saman ew dîmenê xemgîn berzekir..

- Hûn dizanin..?Ez jî yê jiber şerê birakujyê revîm..?Û birayê min,ewê da min kujit û ez da wî

kujim,di êk kartûnê da bûn? Ewa dibinê wê kemîya mezin,ewa diderîya îce da û ez û dujmnê

xwe pêkve revîn û digel êk gehiştin yunan û em pêkve gehiştin Ewropa û em ketin diêk

kemip û nihu em pêkve ne û diêk jorda û gelek şeva liser textekî nivîsitîne. nanek pêkve

xwarîye....?!

Berê xwe da nav çavên hevalê xwe,ewê eve pitir jiçar sale pêkve wek bira dijîn,destê xwe

liser stoyê wî werand û maçek lenîya wî da..

Neşîya xwe,tijî gewirîya wî girî bû.

Azad girîya wî bikenîyeka bilind berze kir:

- Eve filmê hindîye..Dû bira dibine neyar,her dû bidinîyayê dikevin,û litengavîya digehine êk

û har êk dikin.Hah,aha... Kenî jidilê hemûya bilind bû..

Hêşta deng vedana kenîya wan tijî tîkên jora wane.

-û tû kak memo...?Me çîroka aso û saman zanî?Çîroka te çîye?Tû jiber çi hatî?

- Çîroka birayên dujmin.birastî linik min neya seyre.Jiber her dû kesên jiwelatî revîn,dirêya

revêda dibine bira.Jiber ku wan çu dujmnatî digel êk nîne û ne bûye,lê liwelatî xwîna êk

firdkirin,jiber berjewendîya kesayetî.Her dû dujmnên êk bûn,lê cihê pirsîyarêye.bû her dû

pêkve dujmnên min bûn?!

Hemûya berê dane êk,û paşî berê xwe dane memo..!

- Tinê em dujmnên sedam bûn..!Matû sedamî..?

Kenîyeka sar bilind bû.

- ne,hewe jimêje sedam jibîr kirîye.Hewe gelek tişt jibîr kirîne, tinê kursîk û pare libîra hewe

mayne...!

- erê te ne gûte me,tû çi rêkxistin bûy?

- Ez rêkxistina hejar û pala bûm.

- Ha.. Kumunîst.

- Kumunîst bim.Îslamîst bim.Ma hûn na bêjin,em dîmukirasîne.û azadîya hizir û bîraye?

- Erê azadîya hizraye,kesê rê lihewe ne girtî ye..

- Pa şerê hewe liser çi bû...?

- Ew roj çûn,û hîvîye çu çar dûbare nebin.!

- Erê,hîvî ye ew roj bibine xewin û berze bin,lê hîvîya mezin ewe, egerên wî şerî jî bibine

xewin.

Memo neşîya xwe,kenî biser axiftina wî ket.

51

- Raste şerê germ nema..Lê şerê sar hêşta yê şarîyaye..!

Hûn dizanin?Ez jî digel wî karwanî bûm,û diwê wê gemyê da bûm,ewa hûn têda.Ez jî digel

hewe heta yunanê hatim, gelî birayên dujmin...!

Suhbeta wî bikenîyeka ter bidawî înan.

Azad gût,piştî vê carê jidil kenî..

- eve ne filmê hindîye, eve filmê kurdîye...

- Bû her tiştekê ne yê rast û ne beraqil bit,em dibêjnê filmê hindî?Hind milîyareka

mirovaye,bihizareha milletin, bihizareha dîyanetin,bihizareha partiyên sîyasîne,bisedan

hizara aydulujî ne.

Lê êk welat,êk xak,êk ala,êk hukmet û êk hîvî û armancin!

Nihu bizanist û zanînê xwe gehandîne ber perên esmana, û dinîya hemû bû hizar hizra

dikit...!

Em...?Me çi heye..?Em milletekin,sernivêsa me hindî gondekê hindêye.Em êk millet û êk

ziman û êk dîn û êk armanc û êk paşeroj..Lê çend berjewendî,çend ala,û dû desthelat,û dû

hukmet û dû perleman.jiblî wan parçên heta nihu neşên bizimanê xwe baxivin.Nabit em xwe

bînine rêza hindîya,em tinê wek xwene.dibit kew jî wek me bit,jiber liçîyayên me dijît...!

- Malate..Te çi lime kir?Em jî milletekê xodan mêjo ne.mejî têra xwe zana û aqildar hene..

- Zanîn û aqil çewa limirovî dîyar dibin?!Ez dê bersiva xwe jî dim..

Ew milletê êkgirtina xwe neparêzit.ew milletê zana û xwîndevanên xwe ne parêzit.ew milletê

mavê xelkê xwe ne parêzit.ew milletê mavê şehîdên xwe neparêzit.ew millet ne hejî jiyanê

ye..

- kî dibêjit milletê me van hemûyan na parêzit....?!

- Bira kujî we dibêjit..

- Bira kujî nema..

- Heta kengî..?!

- Heta heta.. Û bû zanîna te,milletê me gelek jivan tiştên te gûtîn ne jiwelatên dewrubera

kêmtire,lê hûn ev biraderên hizir çep.dinîyayê wek xewna dibînin..!

- Parastina mavê welatîya ne xewne,êkgirtin ne xewne, zanist ne xewne,her êk lichê xwe û

lidûv şîyanên xwe ne xewne...

- Em yên dinav gurga da,û şoreş hêşta berdewame.

- Eve hêceta hemû bîrcewazîya û nasîyunalîsta ye.

- Nihu te çi divêt?Serê me lê bû êş.

- Min divêt,em wek êk bijîn,azadî,dadiwerî,wek hevî.

52

- Bes...?Eve ne daxwazyên te?!

- Û kes çu çara ne bêjit filmê hindî,eve filmê kurdî ye...!

Kenî bilind bû,lê her wekû dilê wan,mejyê wan.Kenyê qebûl nakin,herzû şînwarên wê kenyê

bûn Hizir,bûne enîyên girê..

- eve demekê dirêj bû,em jivan suhbeta dûr bibûn,hîvîye eve dubare nebit,bila dilê me bes

tijî xwîn bit.

- erê raste...Hûn naêne derê...?

- Çi heye liderê...?!

- Eviro senterê bajêrî dê tijî mirov bit,eviro roja derkirina sihirebend û şeytana ye.Her sal

livê rojê vîstevala serketinê liser mirovên xirab digêrin..!

- Erê,bila ew sihirebenda û mirovên xirab bikine der.Û em zana û xwêndevana bikine der..!

- Mame çi gût?Bese,behsê filmê kurdî nekin.

Ew bajêr tijî mirove,her hindeka birengekî xwe xemilandî ye. Hinda xwe kirîne

sihirebend,hinda xwe kirîne şeytan,û hind dizin û mirov kujin..

Liberamberî wan hindeka xwe kirîne fêrs û pelewanên bajêrî..

Birengekê şanogerî vîstevala xwe birêve dibin.Xelk temaşa şerê fêrsên bajêrî digel wan

xirabe mirovan dikin.heta jitûxîbê bajêrî dibine der.

Dibite keyiv û dest qutana xelkê bajêrî.

Hindek şirînahî û yarîya biser biçûk û mezina da belav dikin liser lêvên cada tijî mirov û

taybet biçûk,eviro roj roja wane, her êk ji wan tijî turkê xwe şirînahî û yarî kirîne.Bajêr

direnga ra berze bûye,keyiv û xweşî ya dibart.kesê ageh jikesê nîne, her êk tinê ageh jixwe

heye,jixweşîya xwe heye..

Heker mirov pirsîyara xelkê vî welatî hemûyan bikit,û bêjitê navê serokê hewe çî ye?

Pitir jinîva wan dê xwe turekin û dê bêjin,ew ne xema me ye!

Lê heker tû navê roman nivêsekê emirîka latînî bêjî.ew dê navê sê çar romanên wî bêjit....!

Libin Balîfkê her pîrejineka welatê me,belavokeka partîyekê ye.liberşûtka her pîremêrekî

radîoyeke.her mala dû kur têda bin,navê şehîdekî yê liser êkî.Her pirsîyareka ramîyarî bête

kirin,dê hizar bersiv bû êne dan,dê hizar rê û çare bû êne dîtin,dê hizar bisipûr bû peyda

bin.

Lê dema pirsîyara xwêndekarekê zanko yê bikin û bêjinê Ehmedê xanî kî ye....?

Dê bêjit..Peykere...!!

53

(16)

Deng bilind dibit,dûkêl nêzîk dibit,qêriyên biçûk û jina bilind dibin,bêhna dûkêlê her dijwar

dibit.dengê tup û firoka her nêzîk dibit.

Dinav nivîna xweda yê maye asê.nivîn yên buyne çeper.

Dujmin nedîyare.cihê revê ne dîyare,çekê didestîda vala ye,heval hemû dixeweka giranda

ne.

Her deng bilind dibit,her dûkêl tijî difina wî dibit.Gohên wî jiqêryên jin û biçûka bûne kanîya

xwînê.Dengê tupa xanî hejand.firoke tijî serbana bûn.

Mirin wek polîsên diktatura likulana fîtîya ligîyanê biçûka didin.

Dinav nivîna xweda yê girtîye,qeyddare,çu jê naêt,çekê wî tinê dû çavên zilin.fîşekên

gewirîya wî nemayne.deng jê naêt.pêstirkê yê girtî..

Deng jiber pîya hat.agir yê bidehmena daya wîve.rîhên babê wî kuzirîn.

Ew firokên tijî esmana,wek volkanê dinîya hemû kire Agir û xwîn,baraneka şîn jê

dibarî.esman dîyar nakit jifiroka.her kesê çipkeka wê barana şîn vê ket.leşê wî wek befira

liser pela dihelyêt.

Lidawîya wê vîstevala mirinê,ew hemû firoke liesmana

bûne êk firoke.esman hemû bû zikê wê,ew zik wek seradê kun bû.barana şîn wek tavyên

bihara jê dibarî.

Her sê birayên wî,wek sê şemalika pêkve helîyan,digel her sê xûşka têkel bûn û bûne

peyker..

Babê wî çav lê zil bûn,bêhn lê teng bû,wek kura likelexê dayika wî digerîya.da liber tenişta

wê binivit..

Deng her bilind bû,divîya bikite hewar,divîya bikite gazî, divîya ditana wan biçit,divîya

birevit..

Nivînên wî bibûn daralînik,dest û pên wî girêda bûn.çu jê ne dihat.

Lihndav serê wî,sîlaveka wê barana şîn jibin zikê wê firokê jorda hate xwar.goştê leşê wî

digel yê xûşik û bira û dayik û baba têkel kir.Berî herdû çavên wî jiserê wî birevin,bihemû

hêza xwe kire hewar..

54

- Heware.. Heware..

Wek har û dîna serê xwe lidîwara dida.

Her sê hevalên wî xwe jitextên xwe havêtine der û jor ron kirin.

- Aso.. Aso, rabe,hişîyarbe,texêre?!

Destên wî girtin da xwe ne êşînit,lê hindî ewa biçavên xwe dîtî ya kirêt bû.qêryên wî biser

wê kemipê ketin.heta tijî devê wî kev bûy.her sê ya neşîyan dinav cihê wî da bihêlin.

Hevala dilê wî û enîya wî perxandin,hindek ava tezî linav çava kirin,wek mirîyekî kete ser

cihê xwe..

Jorbê deng bû,her wekû ew mirovên diwê jorê da,jigorî kêşayne der.rengê hemûyan zer û

pêtî bû.

- Bê lume!Ya wî biçavên xwe dîtî.kafir ne bînin...!

- Erê..Pitir jipênc hizar mirov hatin sotin,pitir jisîh hizara heta nihu dimirin.

- Babê wî,dayika wî,şeş xûşik û bira.lipêş çava,çav lê zîq bûn,ma eve kême..?!

- Heker wî nekirba hewar,heker wî hûn hişîyar ne kirban...

Ez da hewe hişîyar kim biqêrîyeka ji ya wî dijwar tir...

Her wekû aveka tezî linav çavên hemûya kirîn.

- Te xêre kak saman...?!Rengê te jî yê pêtî bûy..?!

Yê dilerzit,xuhê leşê wî yê ter kirî.çav diserîda dizîqin,mûyên leşê wî wek bîstê jijî yên tîj

bûyin.

- şeq şeqa seqatên girtîxana ebuxirêb serê min hêr kir.kit kite hevalên min lipêş çavên min

ser jê kirin,nînukên wan bikêlbetana hilkêşan.Her razî ne bûn,lipêş çavên me hemûyan,kiç

kirêt kirin,dayik rûs kirin,bab û bira kahireb kirin...

Min neşîya xwe ragirim,min neşîya xwe liber van rengên eşkencê bigirim.

Çavên min neşîyan wan hemû dîmena bibînin.Gohên min neşîyan hewar û qêryên wan jin û

kiça qebîl bikin.dilê min haha da peqit,dengê min da biser kevit.

- eve çi bû...?Ev şeve,ne şeva xêraye,ev xewnên kirêt lihewe hemûyan bûne mêvan!

- Ev xewne,netinê ev şeve bûyine mêvanên min!Belku her çend şeveka carekê mêvanên

minin.lê ez zû hişîyar dibim û ez kêm cara dikime hewar wek birayê xwe aso.

birastî min nevîya kes vê çendê bizanit!

- Bira,eve ne tiştek şerme!Ewa hatîye serê milletê me neya kême?!

- Pêkulê bikin jibîr bikin,eve demekê dirêje biserda bûrî,ew rijêm nema,dinîya nihu

tenahîye.jibîr bikin,da hûn baştir bijîn.

55

- Xoştirîn lezeta xodê,jibîrkirine,ma em heznakin jibîr bikin?! Lê ne bime ye.

- Madê çewa aso jibîr kit?!Jibnemala wan tinê ew yê maye sax.ew jî nîve mirove.Hemû lipêş

çava bixerdel û sîyanîdê hatin sotin.

Maya hatîye serê helepçe kême..?!Em dê çewa enfal û helepçe û kujtina tevayî û sotina

gonda jibîr kin?!

Jor bê deng bû,aso dixewa xweda wek mirîyekî bê gîyane, saman kete ser cihê xwe hêbetî

û bê hêz,azad dinav hizrada haha dê xendqit.

Tinê memo dinîva jorê da dihat û dicû.

- erê,herê,eve halê hewe hemûyane?Min hiriz dikir ez tinê wek dîna hevalê van xewnên

kirêtim?!

Her duwa serê xwe bilind kirin,wek mendehoşa birê xwe dane memo..!

- ma eve diête serê tejî..?!

Bikenîyeka sivik

- erê..Bawerkin,ez gelek şeva jitirsa wan xewnên kirêt nanivim,min nevêt çavên min bikevne

ser êk jitirsa xewneka dirindeda..!

- hema tû hişbe..!Tû jî ya xwe nebêje,bila dilê me bes tijî xwîn û kul bit.

- Jibîr bike,xwe fêrî jibîr kirinê bikin.

- Erê kak azad,ewa hatîye serê te,tû dişêy jibîr bikî?!

- me dû helbjar yên heyin..!Jibîr kirina ya bûrî..Yan jibîr kirina ya bêt anku jiyanê..

- Te çi helbijartîye?!

- Ez yê bihemû şîyanên xwe kar dikim,da ya bûrî jibîr bikim.. Lipşt xwe bihilim..Careka dî

jidestpêkê bijîm..!

- Erê tû dê şêy..?!

- Ez bawerim dê şêm.Min gelek asteng derbazkirîne,ez

ji nîva rê bûrîm berev pêşve..

- Ev çende lite dîyare.hîvîya serketinê bûte dixwazim..!

- Lê divêt mirovî bawerî bipaşerojê hebit,bêhneka fireh û dan bişaşyên xwe bidit,da careka

dî tûş nebit.

- Memo..? Memo yê xoştivî çi dibêjit?Me wesa hizir dikir,tû mirovekê kumunistî,û

kumunista bawerî bixudê û kitêb û pêxembera nîne..?Û ji agirê qîyametê na tirsin..?Pa ew

çi xewnin tû jê ditirsî..?

Bikenîyeka bilind û serê xwe hejand..

56

- Hewe carekê dîtîye,yan goh lê bûye?Xudê yan pêxember yan milîyaketek ji esmana hatîye

xwar û gunehbarek siza day?!

Gelî bira..Her mirovin deshelatdaryê liser erdî dikin,û ez bawernakim,kes jixudê bitirst..!Her

kesê bitirst,ji hevalê xwe, yan jizordarekî ditirst!Jiber her kesê dijiyana xwe da çu

şaşîya ne kit,ma dê bû jixudê tirst..?!Xudê dibêjit hûn şûna minin liser erdî...

- Erê, lê kes nîne bê şaşî..

- Berî her tiştekî,divêt em bizanin çi tişt dişaşin..?Û kê heq heye bişaşî bidite nîyasîn?Û bi

çi mav ew kar wek şaşî diêne hijmartin....?

- Bira..Şaşî ji erd û esmana dîyare..

- Nexêr..Gelek tişta ez rewa dibînim,lê tû bişaşî dihijmêrî..!

Azad yê dinav hizirên xwe da berze bûy,jihindav serê hevalê xwe aso na çit.Digel bêhna

wî,bêhna xwe dihilkêşt. her çendekê destê xwe didante ser enîya wî,car jî xoha enîya wî

wek dayikeka dilsoz zuha dikit.Didilê xweda hizar awaza dibêjit.

- eve paşe roja me hemûyane,em dê husa bê xudan mirin. kes nabit liser kelexê me bigirît.

Dengê wî biser lêva ket,ew suhbeta dinavbera memo û saman da birî..

- Divêt her bizifirim,divêt ez livêrê nemirim..!

Herdû man hêbetî,berê xwe dan nav çavên wî,zanîn neliser hemdê xwe ye,zanîn tinê kelexê

wî yê linik wan.

- Kak azad..?Kak azad te xêre....?

- Divêt em hemû bizifirin welatê xwe.Em çi dikin livan kulana?Em şerm ji xwe nakin.ma em

şerm jimalên xwe jî nakin?!

Serê her duwa şûr bû,şerm ji nav çavên wan dibarî, nedivîyan wesa xwe bê hêz bibînin.

Dengê memo ji lêva derket,lê birengekê şermîn.

- Ma kê nevêt liwelatê xwe bijît?!

Azad hêşta yê digerma torebûna xwe da dihelyêt.

- Em direwa lixwe dikin,her çewa bit welatê me baştire. Nepasport û ne kar û ne çarekê lime

dikin,em lihîvîya çi ne? Ha..?Kî dizanit lihîvîya çî ye?!

- Tû rast dibêjî,lê ma dê çewa zifirin?Me bihayê nanekê pare nîne!Dê çi bêjine malên

xwe....?

- Ma tû nihu çi dibêjîye wan?Çi direwa bû wan dikî?Û demê tû hatî,te çi gote wan?

Saman bidengekê bê umêdî ve:

- Ez dizanim dê çi bêjime mala xwe!Lê dê çi bêjime deyndarên xwe..?!

57

- Ez ne wek te me,min çu deyn nînin.Tinê deynê liser milên min,û leşê min dixot,deynê mala

mine,jina min,biçûkên min. goneha wan dayik û babên mirîn û dîtina min bû wan bûye kul û

ma didilîda.

Axînekek jimemo bilind bû:

- deynê hejarên welatî hemûyan liser milên mine,min çu pê çênabit bû wan bikim,ne livêrê û

ne liwêrê.û ew gotin û peyvên me digûtin,hemû bûne xewin.

Azad hate ser hişên xwe:

- mirovê roşenbîr divêt çu çara bê hîvî nebit!

- Ewa hatîye serê min,ez jihizir û bawerîya şûştim!

- hûn bixodê kin,xwe jiramîyaryê dûr bêxin.Behsê wan tişta nekin,ewên em jiber revîn!

- Ez û bara pitir ji ewên hatîne derê,ji ber kesê ne revîne!

Û çu layena ne rahêlaye me.Tinê xwe perstina me bû,em tûş kirin,gerîyan lijiyaneka

xweştir,bêy westîyan.

medivîya para kum kin,bidilê xwe bikevin,jin û jiyanê biçerînin,û pûçatîya jî rolek hebû

dihatina geleka da...!

Saman axivtina wî birî:

- Bawer bike kak azad,ez jiber silametîya xwe hatîme,ez yê revîm..

- Nihu ew eger neman,dê bizifire..!

- Nê hizar egerên dî ketin ser,deyndarî gelek jibirakujyê nexweştire.ew jî rengekê birakujyê

ye....!

Aso xwe qulpande ser teniştekê û çavên xwe vekirin

- hewe xêre....?Hûn bû nanivin....?

Her sê ya berê xwe dan aso û bişkurînê lêvên wan nexşandin:

- Em dê nivin..Mame çi maye jibilî nivîstinê..?!

- Şev baş..

- Şev baş..

Jor tarî bû,bê deng bû,lê dil her man hişîyar,mejî her man dizifiroka jiyanê da ne nivisitî...!

"- Sê roj bu te mûlet,tû parên me peyda nekî.dê gîyanê te bihayê wan para bit..Piştî sê rojên

dî,dê te kime pare..!

Sê roj,dê bi sê roja jikîve wan hemû para peyda kim....?

Bisê roja ez neşêm nanî bû xwe peyda kim..Dê çewa wan hemû para peyda kim....?

58

- Ez nihu yê dûrim jiçavên wan,ew cihê min yê nû nizanin,ez yê berzeme.

Lê heta kengî?Paşerojê dê kîve çim?Dê çewa carekadî xwe veşêrim?Evê carê jî min navê

xwe gohart,kempa xwe gohart,ma dê çewa bû min husa çite serî?

Jiwelatî revîm jiber birakujyê.nihu jiber deyndara dê kîve revim?!

Eve çi hate serê min?Birakujî nema,deyn dê heta kengî mînin....?!

Ez dê heta kengî yê veşartî bim?

Xewê dilê saman xaf kir,lê her çendekê dengê xodanê para diserîda deng vedida..

Sê rojên dî..Pare..?Yan gîyanê te...?"

Dengê qutana dergehî,hemû jinav pêlên xewna qurtal kirin, qutana dilê wan zêde bû,hizra

birine rojên enfal û polîsên dujmnî lidemê nîv şev û berê sipêda,dergeh dişkandin û

dihildane jor,bê tirs û destûr..

Her çar rabûne ser xwe,wek har û dîna qesta dergehê girtî kirin..

Sê çar zirtulazeka hildane jor û qesta cihê saman kirin

- tû biçî ye ber esmana,tû bizifirîye dizikê dayika xwe da, jiber me qurtal nabî...!

Hevalên wî man hêbetî

- Hewe xêre..?!Hûn kîne?Hewe çi divêt jisaman..?

- Me gîyanê wî divêt..!Heker evro parên me hemûyan nedit!

- Parên hewe..?!Parên çi?

- Bila ew bêjit,parên çi..!

- saman,eve kîne..?Û çi jite divên?

- Wek hewe goh lê bûy,ez deyndarê wanim,eve gelek cara min xwe veşart,lê ez rizgar

nabim.

- Hilû..Karê xwe bike,dê digel me êy..

- Dê kîve bin..?

- Ew ne karê te ye,û kes jihewe çu livîna û dengî nekit,heker hûn hemû dê êne êşandin..Û

her demê parên me gehiştin, em dê bû hewe carekadî zifirînin..

- Hûn wî jivê jorê dernaêxin,heta hûn me her sêya ne kujin..

- Ew gelek bisanahî ye..

Binav êk ketin wek gurgên har,ew hevalên dijorên birex ve jî litana wan hatin û barê wan

sivik kirin.Bişeq û mista ji jora xwe kirine der.heta ser cadê lidûv çûn.

59

Em dê her zifirin.. Ma tû dê kîve ji ber me qurtal bî..?!

Lêk kum bûn dijora xweve,birînên xwe jixwînê paqij kirin,kes nema xwîn jê ne hatî...!

- Gelî bira..Ez daxwaza lê bûrînê dikim,û ez gelek supasîya hewe dikim.birastî hewe ez

jimirinê rizgar kirim...!

- Pêtivî supasyê nîne..

- Te çi libere?Dê çi kî piştî cihê te zanîn?

- Divêt carekadî likuneka dî bigerm,ev cihe jî dîyar bû,divêt dîsan xwe berze kim,navê xwe

bigihorim..

- Bextê teda,weneke,em wek birane,em dê xwe gurî te kin, kes neşêt destê xwe bikite te

hindî tû livêrê bî..

- Erê raste,dibit licihê tû bicyê kes nebit berevanyê jite bikit..

- Heta kengî hûn dê berevanyê jimin kin...?!Heta kengî ez dê xudan zêrevan bim,û dê ji

jiyana xwe tirsim..?!

Roja wan biwan suhbeta ve bûrî.bişev lêk kum bûn û gelek sehbet axiftin hatin kirin.Lê

kesê neşîya çu çara bikit.Pare gelekin,xudan dibêhn tengin..

Hevalên wî biwan xem û kula ve nivîstin...

Liber dergehê jorê,liser milê xwe zifirî,hevalên wî dixeweka kûr danin,hêşta bêhna xwînê

jiseruçavên wan zuha nebûye.Divîya xwe pavête ser kelexê wan,divîya kitkte biçite serê

wan,divîya xatira xwe jiwan bixwazit.Lê ditirsîya rê lê bigirin,ditirsîya pirsîyara qunaxa bêt

bikin..

Biçavên pir rondik.çantê xwe havête milê xwe û didilda xatira xwe jihersêya xwast û

derket.wek rojên eskerîya giran lidemê qesta berahîya şerî dikirin,zifirîn neya misuger

bû....!

Xew dayikeka dilsoze,gelek cara liber sîngê wê û dinav kirasê wê da,xemên giran diêne jibîr

kirin,diçine govend û suhbeta wê..

Xewê jî gelek cara baca xwe divêt,û baca xewa wan gelek dijware,jiber giranîya barê wan,û

giranîya xemên wan,xewinên dirinde dibine mêvanên wan,wê xewê jî lê dikine jehr..

Her çendekê cilfek biêkî dikevit û hişîyar dibit,lê hindî xew liber dilê wan ya bitame.nevên

çu çar jê hişîyar bin...

- Azad.. Aso..Hilûn, saman nedîyare...?!

Licihê saman gerîyan,zanîn vê carê jî pîstê xwe guhart,vê carê jî bû mişextê warekê ne

dîyar.

- Hûn çi dibêjin?Dê kîve çit?

- Hindî wî pê çê bit,dê xwe veşêrt..

60

- Nê çu cih neman,çu welat kesê wernagirin.

- Bû demekê kurt,dê şêt xwe xudan kit..!

Rêyaqaçax,xerîbî,dûrketin,westîyan,şer,kujtin,enfal talan, sotina gonda,welat,dayik û

bab.....

Hemû wek fîlmekê tumarkirî lipêş çavên wan xweya dikir...

Her sê wek girtyên qeyd bipê,hişik û bê gîyan dihizra da man xendqî..

Dengê dergehî wek birîyara liêbûrînê,her sê jiwê ezabê rizgar kirin:

- Telefun..Kak azad telefune,bû te jiKurdistanê..

Hersê ya pêkve kirine hewar..

- Xêre, înşala xêre...!

Azad rê nedît,nezanî çewa jijora xwe derket,nezanî çewa gehişte cihê telefunê..

Telefun ya liber dergehê serekî yê kempê,êk telefun

gelek mirovin.hemû yên lihîvîya wê telefunê,carekê dengê mala wan bigehite gohên wan,ew

telefun bû hemûyan wek perstgeheka pîroze.

- Helo,helo,ez azadim..Tû kî..?!

- Ez Mamê teme.. Tû çewanî, başî..?!

***

" tû dizanî çu kes û çu tişt linik min jivê kiçê şirîn tir û xweştivî tir nînin?!Ev kiçe min ya bû

xwe xodan kirî.ez pitir jiher tiştekî hez jê dikim.Pitir jigîyanê xwe.vêca bizane,eve min

gîyanê xwe kire didest teda!Divêt tû baş biparêzî.

Ev kiçe min da te,û êmane tû û ew,baş bizane ez jite razî nabim,heker ew jiterazî nebit"

***

- helo, helo, azad

Belê,Mam min guh lite heye..

- Tû çi dikî..?Bû na zifirî?!

- Ez neşêm bizifirim?

61

- Jiber çi?Tû lihîvîya çî?Ne te kare,ne pasport,û ne paşeroje, te xwe liçi girtî ye?!

- Ji ber wan egera ez neşêm bizifirim..

- Were bizifire,welat xweşe,tenaye dê baştir xwe xodan kî, biçûkên te pêtivî tene....!

- Ez neşêm biçûkên xwe xodan kim,ez yê nesaxim.

- Nesaxî...?!

- Erê,ez pêtivî derman û dixitura me,da bijîm.

- Dixitor û derman livara jî yên heyin.

- Derdê min liwelatî derman nabit,ez yê tûşî nexoşîyeka dirinde bûyim,divêt her çend rojeka

kuntirola xwe bikim,û dermana bigihurim,ev tişte liwelatî nîne..!

- Ma heta kengî em dê lihîvîya te bin?!Ma heta kengî em dê direwa libiçûkên te kin?!

- Rastyê bû wan bêjin.bêjinê babê hewe yê mirî,hewe çu bab nînin,bila bê hîvî bin....!

- Û jina te..?Ew dê heta kengî divî ezabê da bit..?!

- Ew jî bisanahîye,bila bêt da wê jî bê hîvî kim!

- Ew çi gûtine?Ma tû şerm jixwe nakî....?

- Ew rastîye,min çu tiştê dî pê çê nabit.

- Van suhbeta neke,were bizifire,bila tû dinav mirovên xwe da bimirî,bûte gelek baştire.

- Ew hîvîya mine,lê gelek zehmete.

- Ji jiyana xwe netirse,ez dê te û biçûkên te xodan kim.Eve çend sale ez yê wan xodan

dikim,tû jî were ez dê tejî xodan kim,hûn hemû biçûkên minin....!

- Piştî çend sala xerîbî,jinû bizifirim û tû min xodan kî?Birastî eve bixwe mirineka dîye...!

- Bû mirine..?!Ma kes xelet nabit?Ma kes xusaret nabit?Ma bela na êne serê kesê?Ma

jixwene ez bîyanî me?Ez babê jina teme,her wekû babê te...!

- Erê weye,lê dê çi bêjime xelkî?Dê çewa serê xwe linav Hevala bilind kim?

- Evan tişta jibîr bike,kesê ageh ji te nîne,û kes neşêt mayê xwe dijiyana te bikit.

- Bawer ke min bihayê nanekê nîne,ma dê çewa zifirim?

- Ka bêje te çend pare divên?Ez dê bû te hinêrim,karê xwe bike û bizifire,bese bes..Te em

şêt kirin.Û wek min gûtî,xema jiyanê û para ne xo,ez dê bû te para hinêrim da tû pê bizifirî.

- Ez dê hizra xwe kim..

- Çu hizir kirin pê nevêt,divêt tû her bizifirî..

62

***

Ew demekê dirêj bû,şev bibûn yar,didanga wê da gelek seyran dikirin,dina pilên wê da

gelek nihênî diveşartin,gelek xeletyên xwe bin ax dikirin.

Carekadî şev lê neyar hat,careka dî,tarîya wê bû

perdeka reş,çav lê tarî kirin,rê lê berze kirin.

"- bizifire.. Divêt tû bizifirî..

- Dê çi bêjime hevala..?"

Liser vê teniştê bû ya dî,dinav nivîna sar da kun û qulaç têkvedan,xew nedît.

"- tû mirovekê gelek zîrekî..

Paşe rojeka geş ya lipêşîya te.."

Cihê wî leşê wî xodan nakit.hevdijî dinavbera nivîna wî û leşî yê xav her ya dijwar dibit.

"- tû neşêy çu kara bikî,tinê mirin bû te fere..

- tû û kar, kar û tû..?

Tû wek say.ne ne.se gelek ji te baştirin..!"

Nivîna wî tijî agir bû,xwe dinavda ne digirt,rast rabû ser pîya. çend firek liavê dan,dinîva

jora xwe da hat û çû,lê jitirsa xew jê sil bit,carekadî cihê xwe dinav nivîna da kir.

Çavên xwe danane ser êk û şidandin,hizir û xem gelek jişidandina çava dijwar tir bûn.

"- çu hizir pê nevêt,divêt tû bizifirî..

- ez dê te xodan kim...Ez dê te xodan kim,wek biçûkên te.."

Dengê mîrzo diserîda deng vedida..

"- gelî gondîya,ji evro û pêda,em xema çu tişta na xon,dê kurê gondî azad,azadê gelek zîrek

û şareza.dê hemû karên me bicih înit,her xemeka gondî hebit,ew dê çareser kit.Dê bû kurên

gondî kara bînit,dê rêya gondî qîr kit,dê mizgevtê înte gondî,dê xwandingehê înte gondî..

Babê wî axivtina mîrzo birî û got:

- dê kahrebê divan roja da bû gondî kêşit."

Dibû dest qotan û tlîlyên kiçên gondî..

Lê hindî bêhna xwe çik kir,çu deng ne gehişte gohên wî. serê xwe bilind kir,kes lidur xwe

nedît,tinê dengê qutana derî tijî jora wan bû..

- Vekin..Em polîsin.

Hêşta kes jihersêya jinav cihê xwe derneketî,dergeh jibin kirin û hildane jor.

63

- kes ne livit..Nasnamên xwe dîyarikin..Kî jihewe memoye?

Her sê man mendehuş,xew û tirs têkel bûn,welatê wan û polîsên rijêmê hatin bîra wan.

- Ez memo me..Hewe çi divêt?

- Em polîsin,karê xwe bike da digel me bêy..

Memo zanî çi serubere,lê hevalên wî pirsîyar kirin Em dişên bizanin jiber çi dê memo

girin..?!

- Erê..Heker wî bivêt hûn bizanin..!

Memo xwe tênegehand

- ez jî nizanim jiber çîye?Min jî divêt bizanim..?

- tû berî salekê yê jiîtalîya hatî,û te liîtalîya daxwaza penaberyê kirîye,nabit liçu welatên dî

vê daxwazyê bikî. divêt tû bizifirîye îtalîya...!

Milên memo girtin,kirine dinîva xwe da û beref derê birin.

Liber derî liser milê xwe zifirî,Bixatira hewe,dibit em êdî êk nebînin,lê min jidil bîyar da,ez

bizifirim welatî..!

Aso xwe havêtê û da bersîngê xwe...

- Ez jî belênê didim bizûtirîn dem bizifirim.

Devê memo tijî kenî bû..

- Em dê êk liwelatî bînin,lê her dê mînin heval.

- Erê..Her dê mînin heval,her kes û bîrubawerîya xwe.

Azad neşîya xwe bigirt,herdû dane ber sîngê xwe û jidil girîyan..

Girîya wan serinca polîsa kêşan,xwe jikuma wan dûr kirin, çend çirkeyek dane wan da

bidilê xwe digel êk baxivin.

- Bixatira hewe,hîvî ye kak azad ez te jî liwelatî bibînim.

- Erê wek heval û bira,ne wek hevdij..

Jor bê deng bû,her dû man bibanê hizirên xweve hilawisitî. neşîyan liser cihên xwe

rûnin,neşîyan liberamberî êk rawestin,çu gotin jikesê nehat,man diwî seruberî da.dergeh

carekadî hate qutan.

- Xêr bû? Ewan polîsa çi divîya?

Wan hevalên birex jora wanve ditana wan hatin.

Livî welatî,kes neşêt çu harîkaryê bû hevalê xwe bikit,ji ber giranîya barê wî.

64

Aso diagirê hizirên xweda dikelîya,neşîya xwe liçu ciha bigirt,her suhbeta hevala germ

dibû,her xoha leşê wî zêde dibû..

- Eve rêya me hemûya ne,divêt em birîyareka mêrane bidin..

- Erê,em çi dikin livan welata?Ewê heta nihu ne hatîye wergirtin,yan ewê kaxezên wî jê

standîn,çi dikin livan welata?Bila bizifirin,em bû nazifirin?Em lihîvîya çine?!

Aso liser milê xwe zifirî

- em yên lihîvyê ew destên me qeyd bikin bizorî me bikine derê..

- Ew roj ne dûrin..

- Ez nahêlim ew roj bêt,ez dê divan roja da karê xwe kim û zifirim....

(17)

Ew jora eve demekê dirêj,bibû mala wî.ew jora hemû demê xwe têda dibûrand.bişev

piştrast dinivîst,bixweşî û nexweşî digel hevalên xwe dijiya...

Ew jor nihu ya tijî mêvanên bîyanî bûy.

Cihê memo, kabirayekê sirîlankî ye.cihê saman,kurekê

efirîqî ye.û lichê aso,pîremêrekê evganîye...

Çu peywendî dinav bera wan danîne,neşên bisanahî pêkve bijîn.Her êk jiwelatekî û

jidurhêlekî.her êk wek xwe dijît.kesê ageh jixema kesê nîne.xwarina wan cudaye. rûniştina

wan cudaye.suhbetên wan dicudane.

Barê azad girintir lê hat.xemên wî zêde bûn.kes nîne gazinda bû bikit.Wan çend demjimêrên

dijorve dibit. binivistinêve dibûrînit.lê heker xewa wî kabirayê efirîqî nehat?!Heker wî vîya

gohê xwe bidite stiraneka dayika xwe?

Heker pîremêrê evganî vîya qoranê bixwînit?Yan wî kurtulazê sirîlankî vîya gohê xwe bidite

stiraneka welatê xwe?

Dê çewa azad nivit...?!

Dê çewa şêt derdê xwe bû wan bêjit?Her roj liber çavên wî reş dibin.her şev liber dilê wî

giran dibin.her bêhna wî teng dibit.her kuxka wî dijurar dibit.

65

- Nexoşîyeka mezin ya lite..Divêt tû lijora me nemînî..

- Eve jora mine,heker hewe divêt hûn dişên pirsîyara joreka dî bikin...?

- Nexêr..Em sê ne, û tû êkî.divêt tû pirsîyara joreka dî bikî, yan biçîye xestê..?

Dinavbera wan da,roj bû rojê nexweş dibit.Eve demeke çu telefun jiwelatî nehatîne..!

"- erê wan ez jibîr kirîme? Eve xêre?!"

Telefuna giştî,ewa liber derê kemipê,eve demekê dirêje ya şkesitî û kes çê nakit,eve çend

cara çê kirin,lê serxoşên kempê carekadî jikerba xemên xwe da dişkênineve.

Peywendî neman,çu rê nînin,tinê ew telefun bû,nihu ew jî kar nakit..

Her barê wî giran dibit,hîvîya wî berze dibit,bêhna wî teng dibit,çavên wî tarî dibin.

Diwê gêleşuka jiyanê da,kete nav zifirokeka dijwar da, gelek cara bin av dibit.gelek cara

dikete nav agira.

difirî.. Dikete bin pîya..Dibû gurgekê har,biçûkên xwe didane ber leqa..Yarî bigoştê leşê wan

dikir.

Car jî dest û pên wî bizincîra diqeydkirî bûn.livîn jê ne dihat. bidû çavên zil,destê jina xwe

dinav destê kabirayekê bîyanî da didît.yarî bipaxlên wê dikirin.xwe dinav kezyên wêda

diveşart.wek dû pelatînka yarî dikirin...!

Her dû kurên wî,licada bajêrî,bûyaxçyên pêlava bûn,cigar firoş bûn,bişev cih nebû lê

binivin.qesta mizgevtê dikirin...

Her xoha leşê wî zêde dibû,her kenîya jina wî dinav destên wî kabiray da bilind dibû.her

biçûkên wî birsî dinivîstin.

Xoh zêde bû,kenî bilind bû,heta gehiştîye hevirkîyeka dijwar. hemû hest hatin sotin.

Bû cara dawîyê berevanî jigîyanê xwe kir,jiwê hevirkîya dijwar,hate ser Dijwarîya

jiyanê.çavên xwe vekirin.dû sê kiçên ciwan yên lihndav serê wî.bibişkurîneka şirîn bersiva

mendehuşîya wî dan.

Sipêde baş,silametîye,keyiva me hat tû hişîya bûy.

- ....

- Tû yê birsî?Yê têhinê?

-....

- Te tiştek divêt?

- Ez likîve me?

- Eve pirsîyareka ciwane!Tû yê lixestê..!

- Bû..?Çi limin hatî ye?

66

- Çi ne.Divêt tû bêhna xwe bidî,tû gelek yê westîyay.

- Ha..?!Hûn jinû pêhesîyan?Eve şeş sale ez yê westîyay..!

- Belê..Te çi gût?

- Çine.. Çine..

- Te negûte me?Dê çi xûy?

- Min divêt telefuna mala xwe bikim.

- Bila..Lê piştî xwarnê.

Dû sê dixtor,digel dû sê harîkarên wan,û dû sê

Kes jirêxiraweka mirovayetyê.Lihndav serê wî dirawestîyayne.

Wek mendehuşa berê xwe dida nav çavên wan,dizanî eve ne hatîne seredana wî,dizanê eve

hemû jibû karekî ne siroştî hatîne,dibit jibû xatirxwastina dawîyê bit?!

- Bibûre,me gelek pêkul kir da peywendiyê bimala te bikin, lê cihê daxêye me neşîya,û te çu

nav û nîşan û telefunên çu kesa liewropa nedane me,em peywendiyê pê bikin, vêca em

neçar bûn vê peyama nexoş û dil tezîn êkser bigehînine te...!

- Peyameka gelek girane,lê em bawerin tû mirovekê xudan îmanî û bihêzî.dê lime bûrî..!

- Bêje dixitur,ez jimêje lihîvîya wê peyamê me,ez jimêje lihîvîya mirinê me,ez jimêje yê

mirîm...!

- Peyam eve ye..Jiyê te kêmtir jisê heyiva maye.û em bawernakin tû pitir jisê heyiva bijî,û

cihê daxê ye,zanist neşîya çu çara bikit.ewa me kirî çu mifa nebû,û em neşên pitir bikin.Em

jidil daxwaza lêbûrînê jite dikin.û her tiştê tû bixwazî divan sê heyivada,em di amadene...

- Daxwaza min.ez bizifirim welatê xwe.hîvîye bû min pilêtekê bikirin û min bihnêrine welatê

min..

Wê pîrejina jirêxirawa mirovayetyê hatî,bidilekî pirkuvan gût:

- heker dixtor destûra sefera bidin,em dê te sebehî hinêrine welatê te.

- birastî ez bitinê neşêm vê birîyarê bidim.

- divêt ez her biçim,bila ez çend rojeka digel biçûkên xwe bijîm,paşî mirin bila bixêr bêt..

(18)

67

Tijî difina wî bêhna axa welatî bû.mûyên leşê wî tîj kirin. xwîna dilê wî kire volkan.

Liser lêva tuxîbî.sê çar destên dehul û zirna,hatîne berahîya wî.çend xelkê gondê wan û

gondên rex û rûya.liberahîya wî dileyizin.tilîlîya esman kun dikir.xemla kiça evînî har dikir.

Serê xwe bilind kir,jidûr ala Kurdistanê liser avahîyekî yê bilind bû.

Kenî,bişkurî, kuxî..

Sê çar tulazeka bilind kire ser milên xwe.

"- me jinû zavakir..Me jinû zavakir

Kaku azado.. Me jinû zavakir..."

Divîya bikite kenî û bêjit:

-Ne ne,ez yê bûme zava û wa he bûke

Lê hindî govenda wan ya şarîyay bû û hindî tilîlî û zirna dibilind bûn.ew gûtin man didilî da.

Mîrzo yê bixencera babê xwe dileyizit.pismam û kur xal, haha dê serê xwe xon,dûtmam û

xûşik yên bûyine teşî.

Bira wek sufîyekê dîndar yê dihal çûy.Dayika wî,babê wî

Jirêya gorstanê beref kuma wan bidewat û tlîlî dihatin. muxtar,her çendekê destê xwe dibite

paxla xwe û şabaşa didite zirna bêjî.

Mamê wî bidemanca xwe ya sitîlî di xurit.dewat beref gondî çû.ewên neşîyayin bêne

tuxîbî,hatine berahîya wan lirexê gondî.

Gond bibû vîstevaleka hunerî.berê zavay dane mizgevta gondî..

- Dê kîve çin?!Min divêt biçime mala me?Dê min kîve bin?! Ew ne rêya mala me ye?!

Av ya germe.zava jiser mila înan xwarê.serê wî baş şûştin.

- eve çî ye?Ma çi mal nebûn hûn serê min lê bişun?

Ka Mamê min?Ka pismamên min?Ka muxtar?!Hewe bû limalên wan serê min ne şûşit?!

Kesê persiva wî neda...

Tilîlî û dengê dehul zirnayê her yê bilind dibit.

"-me jinû zavakir..Me jinû zavakir

Kaku azado.. Me jinû zaakir..."

Carekadî zava danane ser milên xwe û bidestqutan û stirana,beref gurstana gondî birin.

Dê kîve çin?Ma hûn min na bine mala me?Ma ez ne zavame?Dê min bibine ser cihê min..!

68

Dayika wî bersiv da:

- dê bîye mêvanê min,û yê babê xwe.Ma te nevêt lime bibîye mêvan?

Lipişt xwe zifirî,jina wî nedîyare,biçûkên wî yên dinav destên hindek jinka da digirîn.

Hindî kire hewar,hindî vîya xwe jiser milên wan tulaza pavête xwar.

neşîya,linav goristanê,dîlan germ bû.her çendekê tulazek dileyizî,û êkê dî stiran digûtin.

Liser milê xwe zifirî,gondê wan yê mezin bûy.cade ya bûye qîr.xwêndingeh,ya

avaye,mizgefit ya hey,dartêlên kahirebê tijî kulanane..

Zanî mîrzo rast digût:

"-hey lû, hey lû lawkê gondî.."

Digermatîya dîlana wan da,xwe dirêj kire dinîva dayik û babên xweda.divîya binivit,lê

gondîya hemûya karê xatirxwastinê kirin.

Melay xatira xwe jê xwas,mixtarî pişta xwe dayê.kes nema lihindav serî,tinê dayika wî û

babê wî.divîya gazî gondîya bikit,lê kesê goh lê nebû.divîya bikite hewar.çû deng jê

nehat.divîya rabite ser xwe,û qesta gondî bikit...

enîya wî biwî helanê liser sîngê wî ket...!

zanî mêvanê dayik û babê xwe ye...!

-2004 12 23 destnivês bidwî hat "nûrnbêrg"

-2005 2 5 bû cara dawîyê liser kumputerî hate nivêsîn "nûrnbêrg"
**

ŞEVÊN PIRAG

Roman
Hesen Îbrahîm
(her demê bême kûştin,bila biwerimim.
Her demê bême girtin,bila dizîndanê da birizim.
Her demê bême dûr Kirin jiwelatê min,bila min bibine cehinemê...
Tinê eve hemû ne bidestên wê şoreşa min gelek viyay û kar û xebat bû kirî bit...!)
(Hesen)
Diyarî
Bû her kesê pê lidilê xu nay,jibû ser bilindiya xû,û welatê xu..
(Hesen)
Sopas bû
Wî heval û bira û xoştivî yê jipeyva êkê min nivisî,heta ev berhemê dinav destên
meda digel min,harîkar û çavdêr û gelek cara Mamusta..
Huzanvan û niviserê hêja.bilind Mihemed
(Hesen)
2
_ 1 _
_ iha livêrê bû..Erê,erê,iha livî cihî bû..
Wek nesaxekê ta sar lê,lerzikê girt,dinav cilkên xûda berze bû.
_ eve şûn golleyên wanin liser vî dîwarî..
Çavên xu jidîwarî beref cadê şor kirin.
_ eve şûn gevizka Elî necefî û azad hewlêrî ye..
Lidur xu zifirî,her wekû litiştekî digerit.
_ erê..Her wekû vê gavê,rûydan ya lipêş çavên min. Ez çucar jibîr nakim...

Çav lê zîq bûn,mûyên leşê wî bûne zilptik,diniya lipêş çava gewir bû,zifirî.Dizifirokeka
gelek dijwarda çû xwarê.
Livîna hevalî wî,hizirên wî cemandin.Zanî likîveye.
Xu ragirt,hizirên xu cemandin.Neşiya biwê selîqa dengî biaxivit,ewa berî wê gavê pê
diaxivit.
Dengê wî,awazên giriyê jê dihat,bêhna xwînê jê difirî.
Her çendekê,qorçek ligewriya xu dida,da axiftina wî biser bikevit..
_ Elî,kete ser tenişta xu liber vî dîwarî..
Hizirên wî,şer digel livîna dest û çavên wî dikir.wek lêbukekî lipêş çavên hevalê wî
xûya dikir.
_ azad dixwîna xu werbû,wek dîklekî,dema serî lê dibirin.Her xu digevast,berevanî
jigiyanê xu dikir,şer digel îzraylî dikir.
Bê deng bû,serê xu hejand.
_ erê şeveka reş bû,jiyana min serubin kir.
Rawestiya,bêhina wî gelek bizehmet biser diket. Wekû pîremêrekê nesax,biser çiya
bikevit.xohê leşê wî ter kir,wastiya.
Hevalê wî,destê xu dana ser milî.
_ jibîr bike,eve rêya şoreşgêra ne..
Berê xu da hevalê xu,hest bitenahyê kir,zanî neyê bitinê ye,wek caradî.
3
_ bawer bike,bêhina xwîna wan hêşta tijî mejyê mine.Madê çewa jibîr kim?

Ew dîmenên kirêt,ewên gelek şeva nehêlay binivit. Gelek cara xwarin liber dilê reş
kirî.Ew rûydana,bûye beşek jijiyana wî.neşêt jibîr bikit,neşêt bêy wê bijît. Çend
carekê,jidil keniye,xoşiyek bû çê bûye,yan digel hindek hevala geriyaneka xoş kiriye.
Gevizka azad,dinav xwîna Elî da.hatiye pêş çava.
Dil lê çirmsandiye,dinav hizra da bû kuvlik..
Tila wî ya şehdê,cih nîşa cîhanê dida.
_ iha eve cihê ketina wane..iha livêrê şer digel manê dikirin..
Her wekû wasitiyay,hizra ser jihemû livîna stand,digel pêlên xu jorda bire xwarê.
Neşiya liser pên xu,xu bigirt,pişta xuda wî dîwarê hêşta şûna golleya diyar.
Rengê wî zer bû,diniya liberçava zifirî,şêlî bû..
Dengê golla tijî gohên wî bûn,qêriyên Elî necefî, diserîda deng vedidan,digel bêhna
xwîna azad hewlêrî,têkel dibûn.Wek vistevaleka hindusa,ditariya şevê da,bûne
perstgeh...
Destekî giyanê wî hejand.
_ xu ragire,ew bihayê azadyêye..
Hizirên wî,wek çîçelukên kurkê,kum bûn.
Cih û dem bû diyar bûn.
_ bibure,min tûjî bixemên xu aluz kirî.
_ ew ne xema te bitinêye,lê ew roj û ew rûydan çûn û burîn.jiyan na rawestit.Divêt em
bijîn.

_ raste..Raste,divêt em bijîn.
_ te jibîr kir,em hatîne çi?Em nehatîne liser cihê rûydanê fathê bixwînin.Tû baş
dizanî,em yên hatîne çi!
_ heker min zanî ba,ez dê ême vî cihî,çend ciwanên pirag lihîviya min ban,ez
nedihatim!
_ bibure,min jî ne dizanî te livî cihî,bîreweriyeka hûsa dirinde ya hey.
Diviya hevalê xu jiwî bazinê hizir û xema,bisuhbeteka xuş bînte der.
_ ka bûmin bêje?Hewe livî cihî çi dikir,wê nîv şevê?
Bê deng ma,hêşta dengê hindek gûlleya û qêriya diserî da ma bûn.
4
Hêşta tijî difina bêhna xwîn û barûtê bû.
Hevalê wî zanî,suhbeta wî çu cih diserî da nedîtin.
_ heker dê vê geriyana me têk dî,da bizifirine mala xu?
_ nene,ez êdî wê suhbetê nakim.
Da jivî cihî dûr kevin.
Kulana fireh hêlan,beref nav taxî çune xwar.
Liserê wê kulana teng,rawestiya.
_ ez revîm vê kulanê..Lipişt vî dîwarî,min xu veşart. Heta ew jivistevala xu razî bûyn..
Hevalê wî zanî,çu xûşî jivê geriyanê nabînit.
_ ma kes litana hewe nehat?Kes livara nebû?
_ piştî nîv şev bû.Kes livan kulana nebû.Ewê livara bit,serxuş û bê cih deshelate.Livan welata,kes xu likesê na kite xûdan.
_ û paşî?!
_ piştî jigolle barankirinê têr bûyn,livê cadê wek bayê birûsyê,biturmbêla xu revîn.

_ çend bûn?
_ jiduwa pitir bûn.
Dîsan bê deng ma.Çavên hevalê wî jinav çavên wî ve nabin,diviya suhbeta xu bidawî
bînit,da biçine wê oxera jibû hatîn.
_ min kire hewar,kire qêrî.kes dihewar û qêriyên min nehat.kes limin ne bû xûdan.
Recivka destên wî zêde bû,çavên wî zîq tir lê hatin, lêvên wî dilerizîn..
_ ez çûm ser kelexên wan.Hêşta giyanê wan şer dikir.
_ polîs liwara nebûn?
_ livî welatî,polîs jihemûyan bê desthelat tire.
Axivtinên wî,şiya hevalê wî biroydanêve girêdit.
_ te çi kir?Wesa lipêş çavên te,giyanê xu jidest dan?!
_ min bizorê tormbêlek raostand,kelexên wan kirine têda û birine xestê..
_ bi zorî?
5
_ erê..Wî demê şevê,kes bû kesê narawestit jiber diz û serxoşa.Lê piştî şofêrî ew
kelex dîtîn,gelek harî min kir û xu wastand,û gelek daxbar bû.
Hevalê wî nedviya wê rojê jidest bidit.
_ te ne gûte min,hewe wê nîv şevê livî cihî çi dikir?
Berê xu da nav çavên hevalê xu,zanî barê wî giran kir,zanî ewî çu biçavên xu
nedîtiye,ew hest biroydanê nakit,pê na êşit.
Bikeniyeka zer ve.
_ em jikumbuneka rikeberiya îraqê dihatin.
_ kumbunên nîv şevê diçewanin?!Yan jî kumbuneka kes û sor bû?

Zanî hevalê wî divêt jivî baznî der kevit.Nevêt demê xu bivan suhbetave biburînit.
_ bila wek te bit.
_ helbet wek mine,çi kumbune,kabirayekê şiye û dîndar,wek Elî necefî,digel
kabirayekê markisî,wek azad hewlêrî.digel êkî wek te,nasyunalîst.li vî taxê hejar kum
bikit.heker ne kumbuneka kes û sor bit,û bêhna wêskî û votkayê jê ne firt?!
_ ez ne nasyunalîstim.lê demê milletê min tuşî nexoşiya û qirkirinê bibit.dê
berevanyê jê kim.
Bila tu jî heqî,mezin dibêjin,qona xu nîşa biçûka bide, ne didanên xu..
_ bawer bike,çu cih nemayne jileşê te,min deh carî ne dîtîn,vêca were, "tişî gîvara"....
_ 2 _
Roj ya zere,zeratiya wê,pêlên sermayeka şermîn jê dibarit.
Livî welatî,û livî demê salê,kêm caran roj xu diyar dikit.
Jiber wan avahyên bilind çu xoşî jiwê tavzerkê nîne.
6
Xelkê pirag,hemû yên liser cadan,libarzaran,likulan û gorepana.Mirov tijî hemû
cihane.
Gelek geriyan,gelek westiyan,çu cih bû turmbêla xu nedîtin.
_ me roja xu hemû diturmbêlê da burand.
_ ma me cihek vala dîtye,em turmbêla xu lê rawestînin?
Çavên wan jicihên taybet biturmbêla venabin.
_ raweste.Eve ciheke,heker ne yê taybet bit..

_ bawer neke,ev cihe yê taybete,yê van malaye.
_ em dê pirsiyar kin.Livî welatî,tinê pirsiyar dibê pare ne.
_ tû biliblê heft awazî.hemû zimana dizanî,dê here pirsiyar bike.
_ ma zimanzanîn kêmasiye?
Xu jiturmbêlê havête der,qesta wê jina liber turmbêla xu rawestiyay kir,bi zimanê rosî
kete suhbetê digel wê jinê.piştî pirsiyara wî cihî kirî,û jinê gûtî,hûn dişên livî cihî
turmbêla xu rawestînin.
Gelek xelkê çîk,rosî dizanin,taybet ewên dan emir.
Husên ma bilêva jinkêve,jipirsiyarê çu yadî..
Husên xwandina xu binîvî nekiriye,her karê dest havêtê,jihosta şareza tire..Kurdî,erebî,rosî,farisî,turkî, elmanî.Wek navê xu dizanit.
Gelek cara hevala digûtê.
_ mala xudê ava,te xwandina xu binîvî ne kiriye.Heker da diniyayê xirab kî.
Wî digûte,hevalên xu yên derçûyên zankûya.
_ heker hewe,ew çend reş reşik nexwandban.
Av da hew bit,lê sed qeda bimamustayên hewe bikevin,ewên nasname dayine
hewe,"golka.."
Bêhna wî teng bû.
_ dê were,nê dijiyê pîra te daye,ma tu jisohbeta wê têr nabî?
_ ez yê pirsiyara kiça wê dikim!Eve me cih bû turmbêla xu dît,da bikevne nav dujminî
û dest "bixezayê" bikin..
Turmbêla xu liwî cihtî dûrst kir.
_ tû dizanî,eve ne senterê pirag yê mezine?

7
_ erê..Ez baş dizanim,ma te jibîr kir,ez careka dî yê bûyme mêvanê pirag?
_ pa eve çi cihe?Heker te zanî,tû yê zîrekî?
Lidur xu zifirî,berê xu da wan avahiya,wan cada.
_ ez dibêjim,lê ne sed dersed.eve pirag pênce!
_ raste..Nene,hêşta tû yê liser hişên xu.niza tû jibinê xu jî wesa yê zîrekî?Yan dê min
şermzar kî?
_ lidemê şerî,dê zelama bînî!
_ berî her tiştekî,da biçin têr bixwîn,ez jibirsa mirim.
_ hemû gava tû yê birisî!
_ ma min çi heye jiwî zikî pêve?
_ bin zik!
_ ew piştî zikî ye.heta zik têr ne bit,ew gazinda nakit.
_ da bidine vê cadî.çavê xu liser reşa bigêre.
Ev bajêre pire jibiyaniyan,ew dê hindek cihên xûş nîşa medin.
_ raste,ser reş..Paşî pirç zer..
Kenî tijî kulatê bû,wek dû nêçîrvana,qesta deştê dikin,bisîngê vekirî,bihêzeka
xurt,biberûkên tijî.
_ ka çakîtê te?
_ diniya xuşe,pêtivî çakîtî nîne.
_ û pasport?
_ ew jî ya diturmbêlê da.
_ malate...Ma tu limalêy?!
_ europa hemû mala mine.Wêthe hindek ser reşin.Here erebiya xu lê serif bike,wesa

diyarin erebin.
Xu nêzîkî wan kir,dû tulaz,yên ketîne suhbetê.Zanî ku erebin.
_ selam elêkim..
_ selam..Keremke?
_ biburin,hûn erebin?
8
_ belê..Ez cezayrî me,û eve suriye..
_ me pirsiyara xwaringeheka erebî,yan rojhelatî dikir?Û cihek paqij û tena bû
nivistinê?
Berî bersiva wê pirsiyarê bidit.Wî tulazê surî,gût.
_ hişiyarbe,telefuna xu nehêle diber qayîşa xura,û hişiyarî parên xu bin,eve bajêrê
dizaye!
_ me divêt biçine senterê bajêrî..
_ ev mîtiruye,diçite nav senterî,hûn dişên pê biçin.
_ me turmbêl ya hey,em dê biturmbêla xu çin.
_ ka turmbêla hewe.
_ ya likulana he..
Bi keniyeka sar.
_ turmbêla hewe ya hatiye dizîn..Yan dê ête dizîn..
_ ne ne,berî pêniç çirkeya,me ya hêlaye livê kulanê..
_ dê herin bikine xar,bigehinê,lê ez bawer nakim,hêşta mabit!
Tirs tijî serê wan bû,hizra jituxîbê pirag birine der..
Birine welatê wan yê xwînê,birine rojên desthelata faşiyan,birine rojên serbiran,birine
enfalên reş..

Tirs,hevalcêmkê giyanê wane,pêkve bûyne,û pêkve dijîn.Pêkve dixwîn,pêkve dinivin..
Husên,eve çend salekin,jibin deshelata babê xu der ketî.
Hindî hest bijiyanê kiriye,yê bindest û şkandî bûye.
hemû rengên karî kirîne,cu kar nemayne Nekirîn.
Şivanî,gavanî,xulamî dinav malên farisa da liêranê.
Babekê hejar û şoreşgêr,her jidestpêka Şoreşê, biçûkên xu,dane dûv xu,û livê
şkeftê,bû yadî,û livî gondî,bû yê dî.
Ne çu kar bû wan kiriye,û ne çu mal heye.
hindî bikin,êvarî digel mêvana dine zikê xu,spêdê zû lipariyekê dî digerin..
Wekû girtyên liber sêdarê,hemû yên lihîviya xwarinê, yan mirinê..
Tinê Husên şiya xu jiwê girtîxanê rizgar bikit.
9
Lielmaniya binecih bibit,jibin kuntirula,jiyanê û ya babê xu derkevit.
Hêdî hêdî harî wan jî dikit,ewjî yê bûye xudan pare û mal û turmbêl.
Hêşta jimalê diniyayê têr nebuye.jiber wê hejariya dîtî,kirmê hejariyê hêşta liser
mejyê wî zale..
Ev turmbêle bipêniç hizar yuruya kiriye,liser navê hevalekê xu nivêsiye,jiber
harîkariya dewletê Da ne ête birîn.
Eve pêniç hizar yuru çûn,pêniç hizar yuru..
Dê pêniç hizar pirsiyar êne kirin,her pirsiyarekê,dê pêniç hizar lumeyî hebin.
Dê bine pêniç melyun şermezarî..
_ çi dikirin lipirag?Ma ew cihê wane?

_ bila çavên wan bêne der.Da kes neçite şolên pûç!
Tinê pare ban,kesê ne gûtba,qenc lê hatin,xudan jin û biçûkan.ew ne cihê wane,pûça.
Bila sê caran hindî wan çûban.
Liser milê xu zifirî,zanî hevalê wî,Hesen,yê ketiye dinav zifirokeka dijwara hizra
da,haha dê xendqit.
Navçavên wî yên zer buyn,rê liber çava ya şêliye.
milên wî biwan mirovên birêya xu diçit dikevin,xu jiber kesê nadite paş,wekû mirovkê
kureye.
Liser halê xura,dilê wî bihevalê wî ve ma.
_ çi xudê jite standiye,tu dimala xuda yê serbest bûy,çi jite kêm nebû,xudan
nasname û xudan şoreş.tû bidûv çi ketî?Te çi divêt?
Wî kabirayê cezayrî,ewê liberahiya wan dibezit hizirên wî revandin.Herçendekê
dibêjit.
_ îşela xêre..Xu ture nekin,em dê bînin..
Gûtinên wî,her zû berze dibin,beramberî wê gêleşoka hizirên dijwar..
_ hûn baş cihî dizanin?
Tinê Husên destê xu dirêj kire kulanê,bêy biaxivit,jitirsa hizirên diserî da birevin !
Careka dî,tulazê cezayrî gût.
_ xema nexwîn,em dê bînin,lê divêt hûn bidirustî cihî bizanin,da em lê negerin,û gîro
nebin.
10

_ eveye,ew kulan..
Liserê kulanê,Husên jinav hizirên xu derket.
Her wekû zavay jinav nivînên bûka êk şevî bizurî bînine der..
_ iha ev kulane bû.
Çavên hemûyan zîq bûn,devên wan man vekirî..
_ hûn dipişt rastin,ev kulane ye?!Dibit kulaneka dî bit,ev kulane hemû wek êkin?!
Husên pêt xu lierdî dan.
_ iha livî cihî bû..
Rengê miriya hemû girtin,neşiyan çu axivtina bikin,çu livîn jê nehatin,gewriyên wan
hişik bûn.
_ baş hizirên xu bikin...Dibit hûn dişaş bin?!
Dengê Husên,bêhna hejariyê jê dihat.
_ eve hêşta turmbêla wê jinê ye,eve hêşta,ew biçûkên digel daykên xu yariya dikin
linav baxçî,
Eve ew cihe..iha livî cihî bû....
***
_ iha livî cihî bû,eve hêşta şûn golleyên wanin.
_ eve cihê gefizka Elî necufî ye..eve cihê kelexê azad hewlêrî ye..iha ketin vî cihî...
***
_ 3 _
11
_ wey hûn bixêr hatin,eve deh sale em lihîviya hewe,da tû biçûkên xu bîniye mala
me,her car dibêjê,bila bu cara bêt bit.

Mala xudê ava,vê carê hûn hatin.gelek bixêr hatin..
_ xûdê jihewe razî bit,supas,tû seruberê vî welatî û karê min dizanî.Her bêhnekê
licihekî me.Eve ez gelek cara hatim,tû tinê carekê yê hatî..
_ ez û tû her êk dibînin,merema min biçûkin.te çucara ew ne înayne mala me,divêt ew
jî derkevin
Diniyayê bibînin..
_ raste..iha eve min înan,vêca lime bibure,û hûn jî divêt her bên.
_ ser serê me û herdû çavan,em dê ên,hûn werin, diniya bimirovan xuşe..
_ seruçav ne êşin.
Devê xu bire bin gohê hevalê xu.
_ ma dê me hêliye linav biçûka dixanî ve?
_ diyare te karê xu baş kiriye!Tû mêvanî,her tiştê tû bixwazî,ez dê bicih înim.geremke,te çi divêt?
_ da xu berdine nav milletî..
_ kîve..?!Dûr? Nêzîk..?!
_ nêzîk.. Lipişt van tuxîba..
_ nêzîktirîn tuxîb,çîke.. Mane..?
_ pirag...Beheşta ser diniyayê,warê xezal û kutiran..
_ pirag..!Ev nave min jibîr kir bû...
_ dê baş ête bîra te.
_ bila... Lê..?
_ lê çi..?Tû jidayka biçûka ditirsî?
_ nene,ez şerim dikim.eve çend sale ez ne çûyme wan cihan.
_ baştire,em dê çin,û dê bîrhatên te sax kine ve.
_ ê...Nê...

12
_ çu ê û nê pênevên..Te bivêt,te ne vêt,em dê çin. Mate belên ne da bû min ditelefonê
da?
_ min bawer nedikir tû dê êy û dê bite rastî !
_ hilû, zû binive,em dê sipêdê zû çine oxerê!
_ ez jisuhbeta te têr ne bûyme.
_ hilû,sube ez heta wêrê bû te axivim.
_ ez çucar livî demî ne nivistîme !
_ te çucar oxerên hosa xoş liber ne bûn,heker da êvarî nivî.
***
Hizra ser jihemû deng û livîna stand,kire êxsîrê xu.
dinav pêlên xuda berzekir,bire xwarê,nivand..
Jora wî ya nivistinê,ewa bû dilê xoştiviya xu kirî û cwan lêkday.
Lipêş çava bû şkefteka tarî.Ew jina liber teniştawî,ewa jinav hizareha kiçan,bû dilê xu
helbijartî û jigiyanê xu xoştir viyay,lipêş çava bû pîrejineka heştê salî.
Dem giran bû,şev dirêj bû,hizir belav bûn,xew har bû,leş xav bû,mejî rûn bû,livîn sist
bûn,bê dengyê jor dagîr kir.
Çend carekê,wê jina liber tenişta wî,xu nêzîk dikir, bidestê xu yê nîv nivisitî,jixu dûr
dikir.
Nediviya kes beşdariyê dihizirên wî da bikit,nediviya kes mayê xu dixewnên wî da
bikit,nediviya kes zêrevanyê lê bikit.
dibit nihu kiçeka pirç dirêj û bejin bilind,silav kite çavên wî,dibit nihu bibite mêvanê

dû çavên şîn.
Diviya digel giyanê xu bimînit bitinê,diviya xu berdite bin pêt xewneka har,diviya
bibite êxsîrê xewê..
Xew har bû,hizir şêlandin,giyanê wî lihemû kun û qolaçên jiyanê gêrandin.
Serxuş kir,azirand,nêr kir,leyîzand.Dikuşa kiçeka pirç zerda libaxçekê pirag da
nivand..
Kiç,wek pelatînkê lihindav serî dileyîzit,livînên mêyatyê jê dipeşin,biçavên gohnêlyê
û lêvên sor,qebê wî dixwazt.
13
Her çendekê,xu dinav sîngê wî da dihelînit,
Dibite befir û hingivîn,dev û lêvan lê disojit.
Bêhna wî disîngî da dibû volkan,dilê wî,bû sivorekê tirsinuk,xu dinav cihê xu da
nedigirt.
Dengê gohnêliya wî biser ket..
_ were..Xu nêzîk bike..Were..Ez sotim..Hihhhih..
Hevjiya wî jixewa giran hişiyar bû.Zanî dîsan,siwarekê şerkere,şûr û metalên
wî,digerimin.
Leşê xu yê xav û nîv nivisitî,xuşande ber tenişta wî ya har û germ.
Hezên wî har kirin,şer germ bû,hevrigî dijwar bû..
Lidûr xu,neh deh kiçên nazik û rûs dîtin.Hemûyan dîlaneka har dikirin.xu dixwarin,şer firoş bûn.
Dinav kuma wanda,kete pêlên leşên mê.

Her êkê bû xu dirakêşa.Şer bû liser lêvên wî.
Wek kulmçkeka şemayê lihindav pelên sorên agirî,
diheliya.Çip..Çip..Dinav lêv û
memkên wanda dihate xwarê...
Livîna wî zêde bû,bêhna wî deng jê hat,har bû,leq lileşên wan
dida,neşiya xu.
Digel çipka dawyê jişema leşê wî,biqêriyeka şêtane, jixew hişiyar bû.
Hevjiya wî,destê xu bidevî vena.
_ hişiş..Te hetka me bir!
Lidûr xu zifirî,ew kuma kiçên rûs nedît,cih her ew şkefte,şev her ya
reşe,dem her yê
nivisitiye.
Bû pist pista wî,wî jî nezanî ka çi gût?
Hevjiya wî bikeniyeka şermînve pişta xu dayê..
***
Hêşta leşê wî yê giran,jibin wan hizirên rûs derneketî. Dengê
biçûka.xewnên wî kwîvî
kirin.xew revandin.
14
Milê wî hate hejandin.
_ hilû, direnge,te mêvan yên heyin.
_spêde baş.
_ hizar cara baştir,zavayê delal...Serê xu bişoy ha?
Ne wek gelek cara ser ne şoştî biçiye derê?!
Berê xu da navçavên jina xu,zanî ew xewina şivêdî rast bû.
Jinê hêla dinav cihî da,qesta jora xwarinê kir..
_ em çu naxwîn..Dê birêve bariyekî xwîn.direnge,ka seyda?
_ spêde baş, hêşta yê nivisitî ye..

_ spêde baş.ka rakin, lime direnge..
Dengê wî jijora destavê hat.
_ ma heware?Madê revin?
Herdû jinka gûtin.
_ dê çi revin?!
_ hêşta yê nivisitiye,nizanit ka çi dibêjit!
Keniya wî tijî jorbû.
_ turmbêl..Ez behsê turmbêla dikim.
_ madê evro jî çiye turmbêla kirî?
_ erê, ma dê bê kar limal çi kin?!
_ te em yên înayne geriyanê.
_ tinê evro,em dê zû zifirin.
Çih bê deng bû,her êk dirêyekê ra çu dinav hizirên xu da..
Dengê wî,hemû hişiyar kan.
_ spêde baş,texêre,vê berê spêdê,tû nahêlî em binivin?
_ spêda çi?Çu nemaye dê bite nîvro.
_ ma em çu naxwîn?
_ ne,dê birêve tiştekî xwîn.Direnge,karê xu bike.
15
_ ez amademe.
_ dê,derkeve.
_ hewe çu nevêt?
_ nexêr..
_ silametiya hewe divêt.
_ heta êvar..
_ êvara çi?
_ ma em evro nazifirin?!
_ bêje,heta em bizifirin..

Keniyeka sar lêvên hemûya girt.
_ heta em bizifirin.
_ ne,bextê heweme,zû bizifirin.
_ bila, sûz bit.
Dergeh lipişt xu girtin.jin û biçûykên wan,man hilawîstî. kesê neşiya wê pirsiyarên
diserê xu da bikin..
Dê kîve çin?Dê çine çi?!Dê kengî zifirin?!
Her zû,dengê biçûka,hemû hizirt revandin,tijî mal ding bû..
Jiderve,diniya tijî jiyane,cade pirî turmbêlin,bajêr yê jixew hişiyar bûy.yê berevanyê
jixu dikit,livîn dikuka xudaye.
_ wesa diyare,tû rê baş dizanî?!
Keniya wî biser dengê wê stirana dikasêta turmbêlê daket.
_ bawerbike,salê carekê..Dû cara..
_ çar cara... Deh cara...
Kenî tijî turmbêlê bû.
_ ez gelek cara diçim,lê jibazarê asiya na bûrim.kêm cara derbazî pirag dibim.
_ bazarê asiya?Ev nave min gelek cara goh lê bûye.
_ dê vê carê bînî,dê baş bînî.Bazarekê gelek mezine,tişt lê gelek dierzanin.
_ tişt bitinê?
16
_ hemû tişt..
Carekadî keniya wan jidil der ket.
_ xêrbit,eve demekê dirêje ez hosa jidil ne kenîme?!
_ hişiyarbe..!Ez yê leş pîsim,bila em hosa ne mirin!

_ her livêrê te xu pis kir?!
Bikeniyeka bilind ve gût.
_ şivêdî şeytan yê hatiye min.
_ şeytan?!
Keniya wan jiturmbêlê derket
_ bila tû ligovenda şeytanî xu pîs bikî.Û ez her ne nivim!
_ çê..?Tû nenivisitî?
_ xew biçavên min ne ketiye!
_ xêr bû?Cihên hewe dinexoş bûn?Nivîn dinexoş bûn?
_ nene,cihên me,û nivînên me,jimala me xoştir û paqijtir bûn.
_ pa te xêr bû?
_ xewna..Xewnên kirêt.
_ xudê xêrkit.Ew çi xewn bû,nehêlay tû binivî?!
_ berî çend heyveka.min nêçîreka qelew kirbû..
_ nêçîreka qelew?Ka jiserî bêje,heta şivêdî!
_ tû min diniyasî.ez yê bê bela me?
_ baş..Kes wek min te naniyasit!
_ ez birêya xu diçûm,min ageh jidiniyayê nebû.
_ ê..? Miliyaket,bêje?!
_ kiçeka polonî,ya biçûk..
_ ya biçûk?!
_ erê, çarde..?Pazde salî bû?
_ û paşî?
17
_ bela xu jimin venedikir..
_ mala min xirap bit bûte,tû gelek yê bê belay!
_ min jî dilê wê nehêla.
_ raste,tû gelek yê xêrxwazî!

_ erê bawer bike,min neşiya bela wê jixu vekim.
_ û paşî?
_ paşî berzebû.
_ çi lê hat?!
_ niza..!Min pirsiyar kir,hinda gût ne maye lielmaniya, hinda gût,ya nesaxe.
_ nesax?!
_ erê..Dilê min qetandin,digûtin"aydizê"ya girtî..
_ wey heware..!Û paşî?!
_ ez bûme nîvemirov,çu nemabû,min xu kuştî,paşî hizra dixturî bû min peyda bû.
_ ê..? Bêje!
_ ez çûme dixturî û min kuntirola xu kir..
_ xudê xêr kit?!
_ çu diyar nebû,derket direw,lê nîva jiyê min sot.
_ dê her rojekê tiştek husa ête serê me.Em na rawestin ser kuriya xu. Hizra cih şir kir.
_ erê te negût?Vê çendê çi peywendî digel şivêdî hebû?
_ şivêdî,hemûyê ew kiç mêvana min bû,û min dizanî ya nesaxe,ez jî tûş dibûm.Dibûme rûreş û şermzar, dibûme pêtiranik..
_ mala te,jihemû nêçîrên te,ew hate xewina te?
_ ne bimin bû,çend çarekê çavên min diketine ser êk,dihate pêş çavên min,xew limin
disot.
_ hêdî pajû,lezê neke..
_ çewa lezê nekim.!Zerî û perî,yên lihîviya me.
_ ma te tûbe nekir bû?
18

_ tûba darkukey...Û te..? Ma te negûtbû, piştî mariya çav şîn,jin limin heram bin?
_ dîsan,heker çavên wê dişîn nebit,limin heram
Bit.
Kenyê rê liberberzekir,çu nemabû turmbêla xu liwê turmbêla birex xu ve bidit !
Tirsiyan,keniyan wan xav bû.bezîna turmbêlê kêm kir.
_ hişiyar be,tû gelek yê dibezî..
_ çu nemaye,em dê gehin.
_ ez yê birsîme..
_ liwêrê xwaringehên xoş hene.
_ wesa diyare,hemû tişt liwêrê yê xoşe!
_ pa em hinde rê hatîne çi?
_ heker biber zehmeta me bikevit,Başe.
_ here rêkê,bila dûr bit..Kiçê mar ke,bila pîr bit..
_ wesa diyare,dê baş berkevit!
_ heker me nan xwar,dê dest binêçîra xu kin.
_ heker me nanê wan xwar,nabit,em daxwaza namûsa wan bikin!
_ linik wan,nan û gan,êk rêzin.mirov bêy heduwa najît.
_ wesa?!Pa ew biçi tore dibin?
_ ew dibêjin,namûs ne dinav linga daye.Namûs dimejî daye,diserê mirovî daye.Ew
tiştê dinav lingara,jibû bikarînanê peyda bûye.Tinê ew jixiyanetkariya welatî,û direwa
tûre dibin.Lê birsê û hejariyê,eve çend salin,yên vêrî gelek rewştên xirap kirîn.
_ ne em direwa liwan dikin..Ne em xiyanetê liwelatê wan dikin..
Tinê ya me jiwan divêt,dû çavên şîn..

Herduwa pêkve wek tîpeka honerî.
_ û bejneka bilind û pirçeka zer û bes..
Pêlên keniya wan bidûv turmbêlê ve bilind bûn.
rê û dem hevdijin,eve gelek jiêk sotin.
_ wêhe tuxîbe..
19
_min gût,bêhna mêyatyê ya diêt?!
_ erê..Baş karê xu bike.
_ kuntirul heye?
_ kuntirulekê bê seruber,tinê hindek pirsiyara dikin.Ewjî ne hemû cara.ma me çi jê
ye?
_û bazara asiya,gelek jituxîbî dûre?
_ nene,sê çar kîlomîtran,iha wahe bazare,tû dibînî?!
_ erê..Wesa diyare ya mezine?!
Licihekê taybet,dûr jibajêran,dûr jixelkê wî welatî, herwekû ew mirovên vî karî
dikin,hemû dinesaxin,lewa licihekê hosa kum kirîne da êşa wan xelê dî negirt.
Wek bajêrkekê taybete,hemû cûrên jiyanê lê hene, taybetmendiya asiya ya
xûyaye,xelkê vî bajêrkî, hemû,vêtinamî,kurî,taylandî...Û welatên dewruberên wanin.
Biserve,bazara wan ya aşkira.Firotina cilik û tiştên nav malê û diyarîne,dibinive xodê
dizanit ka çî ye?!
Liberamberî dikanekê,turmbêla xu rawestandin.
Bazar,wek çadirgeheka mezine,dikanên bê seruberin.

Her wekû liwelatên asiya,wek welatên wan,her çendeka,xu daye êk,dikanek
jiçînkûyê,yan jiçadirê, dirust kiriye,tijî cilik û kel û pelên welatên xu kirîne.
Bazara dan û standinê,kêm û zêde,sohbet û kenî. Newek sopermariktên elmaniyane.her tiştekî bihayê wî lisere.
Liher dikanekê,kiçeka ciwan û şirîn,serperştiya firotinê dikit.Wek gerokan,dimînte
bibikirave,da tişta jê bikirin.
Gelek caran,bikirên xu lipişt baleka cilkan razî dikit bimaçekê yan dest perxandinekê,hindek Caran , destên bikiran dinav paxlên wanda yariyan dikin,û
desên wan jî diberûkên bikiran da,baş digerin.Hind hest dikin,tijî ber milên wan tişt
bûn!
_ berî her bazarekê,divêt ez têr bixom,ez jibirsa mirim.
_ hemû gavan tûyê birisî!Dê were çavên xu biçerîne, paşî pirsiyara xwarinê bike.
_ ez jibirsa diniyayê nabînim.
_ dê were,da te têr kim,heker dê min xûy.
Jiwan kulkên van hejara bû xu kirîne bazaru pê dijîn. Avahiyekê çiwan û lêkday diyar
dikir.
20
Binê avahî,xwarngeheka xoş û paqije,liserda wek otêla diyare.
_ eve xwaringeheka gelek xoş û erzane.
_ eve hemû xwaringeh?Wesa diyare otêle jî?!
_ erê,otêle,lê ne otêla normal!

_ ew çewa?!
_ piştî xwarinê dê te têgehînim.
_nehewceye,ez têgehştim.Tû bela xodêy,çu tişt nînin,tû nezanî!
_ em yên livê diniyayê dijîn,divêt em hemû tişta jiwê bizanin,diniya wek mala
meye,gondê meye.
Çewa em bimirin û çu jigundê xu,mala xu nezanin?!
_ tû nebes belay...Tû feylesûfî!
_ xuzî tinê min nîva te xwandiba !
_ mala xodê ava te nîva min nexwandiye.Heker da diniyayê xirab kî..
_ dê çi xûy?
_ma çi heye?
_ eve ne Kurdistane,dê deh rengên xwarinê hebin.Evê kartê bixwîne û bû xu jê
bikire,heta çav reşa he biêt.
_ min soz daye,çav şîn nebin min nevêt.
_ dê zûy be,em nehatîne xwarinê bixwîn.Rêya me hêşta ya dûre.
_ dê hema tû bêje..Şeş lolebû..
_ ma dê çi bit jimirîşka rizî pêve!Em neşên çu xwarinên wan bixwîn jiber berazê
heram.
_ mirîşk, mirîşk..Heta em hêka dikin.
_ bêje ê?!
_ wey hizar cara ê؟؟؟؟
_ piştî xwarinê,em dê hindek tişta kirin bû biçûka,da çu pirsiyar û dûyvçûna nekin..
_ wesa diyare,tû gelek yê şarezay,dê me baş tûş kî?!

_ bazara van,gelek erzane,hindek tişta bû biçûka û bû xu jî bikire.Tiştên baş yên
heyn!
21
Nezanîn ka çewa xwarina xu xwarin,jilezada..
_ em dê jivêrê dest pê kin,çu kun û qolaça jibîr neke.
_bla,lê her êk kurê babê xu,Ez birêya xu,tû birêya xû! Em dê piştî seetek dî linik
turmbêlê vêk kevin!
_ bila,hişiyar be!
_ ne tirse..Heta seeteka dî..
_ heta seeteka dî..
Her jidikana êkê,ew kiçên sinêle û jinên dev bikenî, biçavên xu yên biçûk.Dihatine
berahiya wan,destên wan digirtin,dikêşane nav dikanên xu yên pirî tişt.
Biherdû destan,ew cilik û kel û pelên xu nîşa wan didan.Ciwanî û bihayê erzan,bû
wan şirove dikirin.
Ageh jiçu nebûn,tinê dema destekê nazik jinav
Destên wan diçu der,licihekê xoştir digeriyan.
Linav wan bejnên kin,leşên zarokî,mêyatiya wan ya dijwar.Ser jihestên wan
stand,hestê nêratiya wan har kir.Jidurhêlê xu derketin.dûrketin jihemû rengên
peyweniyan.
Hind ageh jixu bûn,tijî bersîngên wan cill û kel û pelin!
Seeta wan,bû sê çarseet.Hêşta jivê kunê,bû yadî. Nêratiya xu diçerînin.Gelek

caran,sê çar seredan dibirine warekê xoş.
Agirê dilê wan,nêratiya giyanê wan,bimaç û perxandina çend paxlan razî nabit.
Çend ew kar dûbare dikirin,heza wan hartir dibû, dijwartir dibû,sinêliya wan nû
dibû,dibûne gencên çarde salî..
Dikunekê ve,milên wan vêk ketin,biriyar dan,vê vistevala reş û spî,bidawî bînin.Da
germatiya leşê wan,hêza gencatiya wan,bû vistevaleka rengîn bimînit,vistevaleka
kesk û sor.Licihekê taybet.Jikumeka kiçan,jinav gelek bejin ziravan,êkê,duwa,bû dilê
xu jê bigirin.
Licihekê tena,bêy şerm û tirs,dinav lêvên wan yên sorda xu bidirustî,berze bikin..
Qesta turmbêla xu kirin.tijî dest û bermlên wan tiştin, gelek jiwan tişta ew bixujî
nizanin ka bû çine?
Gelek jiwan tişta bikêr kesê jibiçûkên wan jî naên.
Biçavên hilûy û şor,berê xu da ne êk.Şerim jiêk kirin.
eve cara êkêye,hosa şerim jiçavên êk dikin.
22
Serên wan man şor,herêkî diviya bizanit,ka hevalê wî çi kiriye?Çend lêv mêtîne?Çend
dest girtîne?Çend paxil perxandîne?Çend cara xu pîs kiriye?
_ em gîro bûn.
_ erê..
Bê dengiya wan,hewar dikirin,hizar pirsiyar jê difirîn.

_ te çi kirîn?
_ niza...
_ niza?
_ erê niza... û te?
Kenyê ser jiaxivtina wî stand.
_bawer bike,ezjî nizanim ka min çi kiriye!
_ dê siwarbe,eve pirove bûn,nêçîra mezin ya may.
_ma te hindek vîşek mayne,bû nêçîra mezin?!
_diyare te rextê xu her livêrê valakiriye?!Hişiyar be me şermzar neke!Ya tîr ya dibnî
may...
_ nene,ez babê zelamame,ma te jibîr kir,şeva ew kiça ros jiber birayê te revî?!
_ birastî,te wê şevê serê me bilind kir,tû bibû nêrî!
_ iha hêşta ez ew nêrî me!
_ licihê şerî dê diyar bit,ka sehke pêsîra xu,rengê penteronê te yê hatiye gohorîn!
_ma penteronê min bitinê?Teyê xu dîtiye?
Keniya wan,ser jişermê stand.Tirumbêla wan kete ser cada serekî, berev pirag.
_ 4 _
_ navê te?
23
_ Husên...
_ welatê tû jê hatî?
_ elmaniya..
_hatî ye çi?
_ geriyanê..

_turmbêla te çi mudêl bû?
_ mudêl 98
_ çi cur bû?
_ marsîdis..
_ çi reng bû?
_ spî..
_ çi tişt dinav da bûn?
_ gelek tişt..
_ hemûya diyar bike,binav.
_ya jihemûyan girinktir,pasporta mine,ewên dî çu biha nînin.
_ divêt em bizanin,hertiştê dinav da.
_ dû çantên pirî cilik û diyarî.hindek kaxezên taybet bikarê minve.
_ çi tiştên dî?
_ ez hind dizanim.
_ tû kesekî tawnbar dikî bidizîna turmbêla xu?
_ nexêr..
_ kesekî liwara çavdêriya te dikir?Te guman jiêkî bir? Dema te tormbêla xu
dirawistand?
_ nexêr..
_ te liçi cih turmbêla xu rawstandibû?
Wî ziman zanê cezayrî,ewê jiçirka êkê bidûv wan ve, xu gelek wastandî,gelek telefon
û pirsiyar bû wan kirîn, bersiva polîsî da.
_ lipirag pênç...
24
_ divêt em cihê rûdanê bibînin.

Çend pirsiyarên dî kirin,dû polîs,digel Husên û Reşîd cezayrî yê zimanzan,liturmbêla
polîsan siwar bûn,û çûne cihê rûdanê.
Şev ya karê xu dikit,pêlên sermayeka şermîn digel davên tariyê dibarin.
Serê xu bilind kir,kes nedît,hevalê wî digel polîsa çu, hest bitinêyatyê kir.
Dengê wî hevalê digel Reşîd cezayrî,jitinêyatiya wî îna der.
_ eve ew çûn,dê gîrobin.
_ dê kîve çin?
_ dê çine cihê rûdanê,ew karê polîsane.Tû neyê birisî? Neyê têhinî?!
_ jişerim û xeman,min ageh jiçu nemaye.
_ xema nexû,malê diniyayê qirêja destane.
Bibure,navê min Ehmede,jişepirzeya me,me jibîr kir pirsiyara navên êk bikin!
_ navê min Hesene.Tû ne cezayrî?Mane?!
_ ez îraqî me..
_ em jî,em kurdin.
_ ez dizanim,jiaxivtina hewe diyare.Hûn xelkê çi deverêne?
_ Kurdistanê..
_ Kurdistan nihu gelek xûş û tenaye..
_ raste,gelek xûşe,lê heta kengî?
_ ew dimînte liser xelkê wê!
_ biriyar ne didestê xelkê wê daye.
_dê were da biçine vê gazînûyê,tiştekî vexwîn û dê suhbeta xu kin.
_ dê keremke.
_ çend salin,hûn lielmaniya?
_ pitir jideh salaye.
_ kar dikin?

_ car car,kar kême,jiyan bizehmete,û tû liçîk çi dikî?
25
_ ez jî yê livêrê rawestiyaym.piştî gelek welat têkvedayn.
_ çewa dijîn?Wek ez dizanim,livan welata kar nîne?!
_ bû yên wek me,herdem kar heye,em xu jiçu kara nadine paş.
_ liwelatî,reşa malbatê çewaye?
_ mirine,bê kariye,bê omêdiye.Kuştin û tirs û birs.Taybet libexda,cihê malbata min lê
dijît!
_ raste,gelên îraqê hemû dizfirokeka dijwarda dijîn.
Hevalê wî cigara xu berdayê,dinav hizra da,digel dûkêla cigara xu bilind bû.
Çavê xu licihî gêra,cih nexşandiye jimêvanan.
Wek qeftên gola,her dû evîndar liser mêzekê yên ketîne şerê evînê.
Lihindek kun û qolaçan,dû evîndar,yên dikuka xoşyê da dijîn.
Kenî jihemû devan mizgîniya paşerojeka geşe.
Hindek,hêşta negehiştîne Miradan,yên lihîviya nêçîreka gêj!
_ berê xu bide van!Keniya wan,suhbeta wan,jiyana wan.Evan çi heye?Çi jime zêde
heye.Bi çi dixurin?
Jinav dûkêla çigara xu derket.
_ mejî...!Mejiyê wan,gelek jiyê me saxlemtire!
_ erê ew gaz û dahatûyê me didestên van daba.Da çilê kin?!
_da çine ser banê stêra,û erdî bû me hêlin.
Keniya wan jituxîbê mêza wan ya biçûk derket.
Serinca herdû kiçên jiwan wêve rakêşan!
Şerê girinjînê û lêv gezandinê dest pê kir.

Livan welatan,tiştê herê pîroz,hevalîniye,hevalîniya kur û kiçan,nêr û mêyan.Kes
bigirinjînê têr nabit.
Rengê pirça wan,gezandina lêvên wan,her dû kiç, wek megnatîzî kêşane mêza xu.
_ biburin,em dişên linik hewe rûnin?
_ heker çih nebit,werine ser serê me!
Kenî tijî cihî bû.Hesenî zanî çavzilkana wî nêçîrek kir.
26
Lê nezanî ka egerê keniya wan çi bû.
Bêy çu dadwer malê wan lêkvekin,her kiçekê bû xu êk helbijart û ronişte birexve.jiçavzilkanê,ketine dest perxandin û licihên xûştir geriyan.
Kiç livan welatan pêdivî çu jivan û huzan û mêranyê nîne.
Girnijîneka jidil,çigarek,perdaxeka bîrê.Eve next û nîşaniya wê ne!
Markirin,tinê mêtina lêvane.şahî dengê keniya dilê wane,cih û war,sîngê
teye,bawerî,girnijîna lêvên tene!
Dem kete jêr kartêkirina valywmê.ageh jidûrhêlî neman.
Xem,nexoşî,şerim.ew hevalê jigiyanê xu xoştir divêt,û nihu dibin barê giranê xemnda
dinalit,jibîr kir.
Ew bejnên zirav,ew pirçên zer,bûne pelên dijwar.befira kul û xemên wan yên
turmbêlê,helandin.
Xema wî ya jihemûyan girantir,nizanit dê çewa bicilkive kite dinav dilê xuda.
Herçende,zimanê wê jî nizanit,lê livî welatî,û licih û delîvên hosa çu ziman pê nevêt.

Dest digel destan,çav digel çavan,lêv digel lêvan.
Ma ziman bû çiye?!
Dengê telefona diber tenişta hevalê wî ra,jinav pirçên zer înane,ser xemên reş.
_ hûn likîvene?
_ eve em hatin.
Berê xu da hevalê xu.
_ divêt em biçin.
_ ew kî bû?
_ hevalên me zifirîn,yên lihîviya me.
Wek biçûkekê jiber sîngê dayê rakin,eniya wan bû girê.
_biburin,em neşên pitir digel hewe bin.
_ heta dîtineka dî..
_ heta dîtineka dî..
Her gavek dihavêtin,dû sê cara lipişt xu dizifirîn.Jikeniya wan û girnijîna wan têr
nedibûn.
27
Lirexê dî yê çadê,baregayê polîsan,avahiyekê sêwy û bê rewşe.Hevalê wî û ew
zimanzanê cezayrî,wek dû peykera libenda wan bûn.
_ hewe çi kir?
Çu axivtin jihusên nehatin,jitura hizirên xu derneket.
_ jibîr bikin,turmbêl çû,tinê serê hewe sax bit.
Nav çavên hevalê wî,zerbibûn,lipêş çava bibû mirovekê dî,ne ew Husênê keyfxûş û
yarîkere.ne ew hevalê pare linik wî tinê jibû zik û bin zika peyda bûne.

_ kak Husên..Xema nexo,ez dê bihayê turmbêla te hemûyê dim,tinê xu ture neke!
Serê xu bilind kir,her wekû aveka tezî bileşê wî yê germ da kirî.
_ mala te,tû çi dibêjî?!Hizar turmbêl gorî binê pêlava te bin.Xema min ne
turmbêle,xema min gûtinên xelkîne.
Dê bêjin,çubûne çi lipirag?Tû baş xelkê me diniyasî!
_ bila serê xu lidîwara bidin,ew ne mavê wane.
Em Azadin dijiyana xuda,kesê mav nîne dadkirina me bikit.
_ erê..Lê gûtinên wan..
_ herkesê behsê me bikit,ez dê baş bersiva wî dim.Ez kesê jixu şerîf tir nabînim..
_ ya jihemûyan baştir,bila kes nezanit eva hatiye serê me.
_ ez jikesê neditirsim û ne şerim dikim.liser hemûyêra,vê sohbetê bû kesê nakim,û
kes jî neşêt vê pirsiyarê jimin bikit.Û min gelek pêxoşe,bihayê turmbêla te ez bidim,tû
mêvanê minî!
_ heker tû carekadî vê sohbetê bikî,ez çucar hevalîniya te nakim,turmbêl û pêlava te!
Reşîd cezayrî,herdestekê xu dana ser milê êk jiwan.
_ wek min gûtî,turmbêlê jibîr bikin!Nihu hewe çi libere? Dê çi kin?Direngî şeve,hûn
dibirsî û wastiyay ne.
_ bibûre heval Reşîd,me tû gelek wastandî.
_ min we ne gût.min gût hûn dê çi kin?Ma hûn ne dipirsî û wastiyay ne?!
_em dê zifirin elmaniya..

_ vê şevê?
_ erê,ma dê lihîviya çi mînin?
28
_ nene,hûn gelek diwastiyay û turene,em nahêlin hûn hosa biçin.Ev şeve lime bibine
mêvan,û sobehî bidilê xu herin.
Her êkî biriyar hêla didestê yê dî da,çavên wan ketin êk,her zû jêk vekirin,dinav
ewrên xemada neqandin.
_ serşoştin,xwarin,nivistin.Dermanê heweye,dê hemû xemên hewe digel ava serşoyê
çine xwar...
Reşîd cezayrî,eve pitir jideh salaye liçîk.Wî jî wek gelek tulazan, jiyê xu hemûyê
likulanên ewropa binexuşî û dikempên penaberiyêve burandiye.
Mavê penaberiyê liçu welata ne wergirtiye.Welatê wî jî gera bêkarî û hejarî û şeraye.
Liçîk dikuşa jineka çîkî da penaberî wergirtiye.
Ew jin welatê wiye,dayka wiye,hevala wiye,paşeroja wiye!
Roj bû rojê,girêdana wî biwê jinê ve mikumtir dibit. Welatê xu jibîr dikit.Kurê wan yê
çend heyvî.Tameka dî yadaye jiyana wan.Berxudana wî xort tir kiriye.
_ hewe çi gût?Eve demekê dirêje min kurê xu ne dîtiye,direnge,ez yê jê xerîb bûym!
Keniya wî,tama hevalînyê jê dihat.
_ gelek supas,hewyana me liçu ciha naêt.
_ malê diniyayê bû xu nekine xem,hema hûn disax bin...

Dengê muzîka telefona Hesen,hemû şir kirin.Telefon ji berûka xu îna der,jimara mala
wî liser xûya kir.
Berê xu da hevalê xu Husên.
Her wekû Husên lihîviya pirsiyara wî.
_ male! Çibêjimê?!
Bidengekê pir xem û kuvan ve gût.
_ hişiyarbe!Bila nezanin,da dilê wan jî ne êşit.
Telefon da ber gohê xu,jihevala dûr ket.
_ helû?
_bab,hûn likîvene?Te bû min ew tişt kirîn?Te çi û çi kirîne?Dê kengî zifirin?!
Pirsiyarên wî,wek libên tizbiya dane dûf êk,dengê hindek biçûkên dî jî dihat,lê dengê
dayka wî jiyê hemûyan bilind tirbû.
_ bêjê dê kengî zifirin?Bila xu gêro nekin,bila her ev şeve bizifirin!
29
Çu axiftin jihesen ne hat,tinê her digût.
_ erê.. Bila..Her tiştê te bivêt min yê kirî..
_ dê bizifirin..Werine mal..Hûn çi dikin?
_ bila kurê min,em dê zifirin..
_ ev şeve?!Ez nanivim heta hûn bizifirin û tiştên min bînin..
_ ne,divêt tû zû binivî,dibit em direng bigehine mal..
_ nene.. Zû werine mal!
_ başe.. Başe,lê zû binive...Bila?
Telefon jidestê kurî îna der.
_ Hesen?Ma hûn nazifirin?!
_ ê...Dibit em sobehî bizifirin..

_ wenekin!Em bitinêne limal,sebra mejî naêt...
Werine mal..ê?
_ bibure,pîçeka nexoşyê ya bû me dirûst bûy,dibit em gîro bin!
_ nexoşiya çi?Te dilê min qetand?!
_ nene,çu nîne,netirse,nihu direnge,em dê sobehî zifirin.
_ hay jixu hebin!Û gîro nebit!
_ heta sobehî..
_ heta sobehî..
Çavê hemûya lidevê wî bû,ligehên eniya wî bûn, lirengê rûyên wî bûn..
Gohên Husên dibel bûn.Ka dê çi peyv jê derkevin? Ka dê musîka dengê wî ête
gihorîn?
Rengê wî zer bû.gewriya wî hişik bû.Ew xwîna may dirihên leşê wî da,hişik bû.
Reşîd,diviya hemû tişta bizanit,diviya jiwê tengavyê dûr bikit.
_ mala te bû?
_ erê,kurê min bû.Pirsiyara wan çill û diyariya dikir, ewên min kirîn û mayne dinav
sindoqa turmbêlê da.
_ xema nexû,ez dê sobehî dû car sê car,hindî wan bû kirim û digel xu bibe.
30
_ supas,tû camêrî..
_ çu supasî pê nevêt.Dê da biçine mal,da hûn bêhna xu vedin.Hûn gelek diwestiyayne.
_ mal te ava.Me pê xoştire,em biçine otêlekê! Pansyonekê!
_ bikeyva hewe ye,lê divêt her hûn tiştekî bixwîn.
_ ma dê dilê kê çite xwarnê?

_ biraynû..Tiştek bû û burî.Divêt xu hind ture nekin.jiyana xu têk bidin.Diniya û
pare,biber çu nakevin,tinê giyanê hewe û yê biçûkên hewe disax bit.
_ ez ne dixema malê diniyayê me,xema min,gûtinên xelkîne.
_ bila xelk ezmanê xu bicût,kesê çu mav lime nîne.
_ dê geremkin!Hûn diwestiyayne.
Liturmbêla Reşîd cezayrî soyar bûn,beref pansyoneka linik wan berniyas cûn.
Reşîd û hevalê xu yê îraqî,dihemû kun û qolaçên pirag şarezane!Cihên erzan û bê
bela baş diniyasin.
_ ev pansywna em diçinê,gelek erzan û xoşe..
_ şeveke.Em dê burînin!
_ cihê daxê ye,me hûn divî deravî da niyasin.Lihîviya careka dî,hûn bên,da em baş
xizmeta hewe bikin. Cihên xoş nîşa hewe bidin!
_ pirag,liber dilê min reş bû.
_ nene,divêt her em tûla xu lê vekin..
Kenyê,wek biçûkekê sêwî,lêvên wan nexşandin
Lê her zû digeriya Husên da xendqî.
Turmbêl kete nav pêlên cadê.Tariya şevê,xemên giran,serê aloz...
***
... Serê hêstira barkirî,didestê çepê daye.
Dû hêstirên dî bidûvra digirêdayne.
31
Kilaşînkuva babê wî didestê rastê daye.
Bejna wî,jibejna wê kilaşîkuva bûye yara wî,
Negelek dirêj tire!

_ ev tivenge,giyanê te ye!Her demê te hêla,ne êye mal !Başe?!
Berî hemû hevalan,rê dişeqand,jihemûyan şareza tirbû,xoştivyê hemûyane..
Her çend şeveka,dûsê tuxîb dibezandin.Êran..Îraq.. Turkiya.
Çend parên xelkê wê çadirgeha bu wan,bûye welat. Kum kirîne.Digel hindek kesên
jibû jiyana xu û ya biçûkên xu.şevê gelek cara giyanê xu dikine diyarî.
Direngî şev,bidizîve,berev tuxîba didine rê,qesta turkiya dikin,jibû kirîna hindek
pêdvyên çadirgehê.
Hosa xu û herdû jinên babê xu digel kumeka biçûka xudan dikit.
Vê carê,liher sê tuxîba digel hindek hevala yê hatiye durpêç kirin!
Pasdar,jilayê rojhelatve..Cendirme,jilayê bakur ve.. Leşkerê îraqê,jilayê başûr ve...
Şere,agir jiesmana dipeşit.Lihindav serê wan,sê rengên firokan xu dixon,top û çekên
giran,wek barana biharan dibart.
Her sê hêstir bibarve revîn.Heval,terabera bûn.
Kes lidura nema.tinê ew bejin şora kilaşînkufa babê wî,kiriye didestada.
_ eve giyanê teye!Lipişt xu nehêlî !
Biwan destên biçûk,sirmê kilaşînkufê kêşa.Biwî dilê nazik,û wê hizra çarde
biharî,wan çavên mixazirî.
Şer digel sê dirindetirîn û hoftirîn leşker licîhanê kir.
Bizîx û zîrekî û şarezahiya xu.şiya xu bigehînte cihekê tena.Lê xwîna dilê wî,û
gûtinên babê wî,leş lê xuwarin.

Mêraniya babê wî,dişer û xebatê da,wek fîlmekî dihate pêş çava,û gûtinên wî dubare
dibûn.
_ hişiyarbe!Hevalên xu litengaviya nehêle!
_ hişiyarbe!Xu nede destê dujminan!
_ hişîrbe!Jiqada şerî ne reve!
xu berda didilê gelî da.Ber bû berî,tiraş,bû tiraşê.
Heta xu gehandiye hindek hevalan.
32
Çavên hevala bibejna wî ketin,devên man beş bûn,tijî dilên wan hîvî bûn.
_ Husên?!Tû yê bisilametî?Em ketibûn dixema teda!
_ min her zû xu xilas kir,ez yê litana hewe hatîm.
_ em bawer dikin!Tû mêr korê mêranî!
_ û hûn?Çu likesê nehatiye?
_ em herdû dibirîndarin,lê birînên me disivkin..
_ ka hevalên dî?
_ em jî nizanin!
_ divêt ez liwan jî bigerm.
_ ne,ew dişarezane,xema wan nexo,heker bisilamet bin,dê gehine me..
_ dê hilûn,da vî cihî bihêlin,hêşta leşker ne hatî ye xwarê jifirokan...
***
_ keremkin,eve pansyone..
Cilivek biHusên ket,leşê wî hemû hejand.Axînkek rahêla,bû kul didilê hemûyan da.
Pansyon,dinav pencên daristanka tarî da nivisitiye. Herwekû jibajêrî dûr,bêdengiya
wê,pîsatiya cihî,digel xemên wan têkel bûn.Tirsa wan zêdekir..

Rengê girtîxanên leşkerî dida.Mêvanên wê hemû hejar û kêm parene.
Bêhna pîsatyê,digel ya kiholê têkel bûn,digel bê dengyê,wek dîmenê fîlmekê tirsê
xûya dikir!
Liber derê serekî,zegzegekê zelama hate pêşiya wan.
Jitariyê,ser û çavên wî baş nedîtin.Tinê çend dularek xwastin,pêtivî kaxez nasname
nebû!
Ne xwaringeh,û ne gazînûye.hindek jinên jijinkatyê ketîn,xizmeta mêvana dikin.
Lidawya wê kolana tarî,derê joreka bê seruber bû wan vekirin.
Wekû girtiya ketin ser wan çihên gelek pîs û ne lêkday.
33
_ eve em dê çin!Sobehî zû ez dê êm.Ka hewe çi divêt? Ka dê çi kin?
Ez amademe!Lê hîviye,hûn baş û tena binivin,xema tiştê bûrî nexwîn!
_Gelek supas,me hûn wastandî.
_ çu supasî pê nevêt..Heta sobehî..
_ heta sobehî..Çavê kurê xu maç bike..
_ supas..Şeveka xûş.
Digel dengê girtina dergehê jora wan.Dergehê xem û hizirên wan vebû..
Çih şir bû,tarî tijî jor bû,livîn jitirsa hizrada bê giyan ma.
Jibêdengiya jorê,zingên jiperdên gohên wan dihat.
Tinê hindek çaran,demê êk jiwan,ew bayê genî jihinavên xu dihavête der,dibû volkan
û barove.Gohên hevalê xu diêşandin!
Digel wî bayê şer digewriya wanda dikir,û dibû axîng û derdiket.Dihatine ser hişên
xu,lê carekadî dibûne hêsik dinavbera,hizir û xem û xewêda.

Çavên zil,mejî lê hişik kirin.Gehên leşê wan,şere digel cihê biyanî,Nalîna wî,xewê
direvînit.
Yê diçeperî da maye asê,lihemû rexa dujminin,fîşekên wî nemayne,heval
didûrin,liesmana,jiber firoka û muşekan,duayên wî nagehine gohên xodê!
Dengê qotana dergehî,dilên wan qetandin.
Herwekû sîxorên dujminî,dergehê girtîxanê lê vekirîn,da biriyara dadgeha reş bicih
bînin..
Herdû,wek dû şerkera,rabûne ser piya.Rengê wan zer û pêtî bû,berê xu dane êk!
Şerm jiêk kirin,berê xu dane cihê dengî..
Dergeh vebû.Tirsa wan zêdetir lê hat.
çewa dergeh hêlabûn vekirî,liwelatekê wek çîk?!
_ biburin!Hûn pêtivî çu nînin?
Jineka wek zelama,didanên nîv rizî û nîv zêr,hilda jor. Linîva herduwa rawestiya.
_ ne,supas..Tinê me divit,em binivin.
Dengê qotana dilên wan,sist bû,ew xwîna leşê wan, ya berî wan nav çavên zelamkînî
bibîn,hemû revî bû nav mejî.
34
Piç piçe,jurda hate nav gehên xav û zerbûyn..
Dergeh lipişt jinê girtin,hindî xu hejand,xu mê kir, devê xu bikenî êxist.Neşiya çavên
wan yên teyîsuk jigirtîxana xema azad bikit...

Şev,jinîvyê bûrî.Ketin beramberî êk,jitirsa xew jê sil bibit, pişta xu dane êk.
Jûrda,digel pêlên dijwarên hizrada çûne xwarê..
_ 5 _
_ şeva me jinîvyê bûrî,xewa me naêt,eve çend sale,ez hindî ev şeve nekenîme.xodê
xêrikit!
_ bawer bike,dijiyana xoda,ez hindî ev şeve ne kenîme, û çucar hosa min behsê
zelamê xu nekiriye,erê.Xodê xêr kit!
_ ne tirse,wek te gûtî,dîwana wan ya germe,ew ne çûyne berê beytê.Ya jiwanve,em
nizanin ka çi dikin?!
Kenî,dîsan bilind bû,biçûk hemû dinivistîne.keniya xu lidûv direngiya şevê û nivstina
Biçûkan kêm dikir.
_ tû bêjî,dê ev şeve bitinê nivin?!
_ ez bawer nakim,yê min bişêt bitinê binivit..
_ pa hema yê min agire...Ez bawerim,nihu dû sê liber tenişta wîne !
Keniya wan,tuxîbê dem û cihî bezand.Dû sê Biçûka,xu dinav cihên xuda qolopandin.
_ erê,hemû jin dizanin zelamên wan van kara dikin?!
_ nene,hindek mala xu wêran dikin,tinê jiber gûtinekê, yan sohbeteka direw.
_ zelamên me gelek dibaşin.Wek jina qereç gûtî.
35
Zelamên me,dixoşmêrin,dimerdin.Tinê jilayê namûsê ve disistin...
Keniya wan dûsê biçûk jixew hişiyar kirin.

Hatine ser hişên xu,piştî kenyê ser jihestên wan standî.
_ dibit hejara ageh jihindê nebit,bû karê xu çubin!
Eve çend sale jimal dûr neketîne,bila çend rojeka biserê xu bikevin,jinav biçûk û
xemên mal dûr kevin!
_ mejî çu ne gûtiye,tinê bizifirin,nemînne likulana,bû xu ne kine kar.Wek gelek
zelama..
_ erê..Wek tewafa hecê,salê carek dûcar..
Kenyê ser jiaxivtina wê stand,neşiya sohbeta xu bidawî bînit.
_ ne tirse!Heker cihê mêrî limal yê xoş bit!Çucar qesta derê nakit!
_ kiçê,nê hindî jinkên van welata dicanin,qehba,bixodê zelam diheqin bidûv bikevin!
Kenî tijî jor bû,kenyê kuriya hizra kêşa,dem yê bileze, livîna biçûkekî,hizirên wan
cemandin.
_ ma tû na nivî?!
_ xewa min bêy wî naêt,eve demekê dirêje,ez bitinê ne nivisitîme!
_ xodê dizanit,êka çewa licihê te nivisitî ye..
Bi keneka bilind ve.
_ ez bawer nakim bihêlit binivit..
***
_ binive..Bes xu biwasitîne!
_ xewa min naêt.
_ jibîr bike,wek gelek nexoşiya..
_ raste min gelek nexoşî dijiyana xu da dîtîne,lê wek ev şeve,wastiyan û tore ne
bûyme!

***

36

Raste,min gelek xoşî dijiyana xu da dîtîne,lê wek ev şeve,ez ne kenîme!

_ min kenî jibîr kir bû,kes nebû digel bikenim,me demê kenyê nemaye!

_ jiyan pêtivî kenî û sohbet û têkelyêye.Taybet livan welatên sêwy.

***

Pa ez çi bêjim?!Pare korî binê pêlava te,gûtinên xelkî dê min kujin,ez xu gelek
diparêzim.

_ birastî şeveka reş bû!Nîveka jiyê min sût!

***

_ Birastî şeveka gelek xoş bû.jiyan liber min geş kir..

_ divêt hûn çend rojên dî jî linikme bimînin,ez ji sohbeta te têr nabin.

_ hûn jî werin,bila bes em bitê bijîn,şeveka hosa, diniyayê bihemû parên wêve dînit.

_ ez çucar vê şevê jibîr nakim,divêt her çend heyveka,em hosa kûm bibin!

***

_ şeveka hosa,hemû xoşyên diniyayê disojit.

_ gelek şevên nexoş min dîtîne,gelek şeva birisî nivisitîme,liçol û aqara mayme,şer û
serma,tirs.

Wek ev şeve,ez tore ne bûyme!

_ binive,nivistin û jibîr kirin,dermanê mene..

_ ne ez dişêm binivim.Û ne ez dişêm jibîrbikim!

***

37

Xew û kenî,bibûn dû biçûkên şûym.Dinav lihêva germ û paqijda,dest ji şûymatyên xu
bernedidan.Gelek cara, tûxîbê lihêvê derbaz dibû,tijî wê jora cihên wan lê danay dibû.
Wek dû zorbazan,dibû şerê xewê digel kenyê.
Her çendekê,êk biser diket.
Herduwa,şer bû digel spêdê,spêde,herdem ya serketiye,lê bû demekê kurt,şev
zirtekên xu kum dikit, dîsan hêrişeka dijwar dibite pêşiya rojê,lê dikite şev!
***
Xew,û axînik û peşêmanî û şermzarî.Didadgeha rewşt û dîn û binemal û durhêlî
da,gonehbarên dirinde bûn....
_ tû mirovekê bê namosî..Bê şerefî..
_ çi jite kêm bû?
_ xudan jin û mal û biçûk.Te çi divêt?Liçi digerî ?
Te gohê xu da binê xu.Serê me hemûya çemand.Hey tiff....
_ min çu nekiriye..
_ hişiş..da gelek tişta kî.Heker eve nehatiba serê te..
Dadwerê dînî rabû serxu.
_ cihê te cehnema sore,tû zinakerî.Mirovê zinaker,dê hetahetayê biagirê cehnemê
sojit.
Liroja rabûnê,dê çi bêjiye xûdê xu?Dê çewa bersiva xu dî?Yên wekû te,bê
dadkirin,cihê wan cehneme.
Dadwerê rewşta rabû,hemû jipêjve rabûn û xu bû çemandin.

_ eve lidemê mirina wî,lê dijiyana xu da dê mirovekê rûreş û şermzar bit,dinav
mirovên xu da.
Dadwerê binemalê,nehêla hevalê wî gûtinên xu bi dawî bînit..
_ te nebitinê rûyên xu reş kirin...Te em jî bêbiha û şermizar kirin,eve te çi îna serê
me?Heqê te çiye?
Bikuştinê,bisotinê.Bêhna me naêt.Heta heta,te navê me hermand...
38
Lidûr xu zifirî,didanên hemûyan diçîq bûn.Hemû lihîviya biriyara dadwera diamade
bûn.
_ hey hewar..Min çu nekiriye!Min kes nekuştiye!
Min malê kesê nexwariye!Çima hûn behsê wan nakin, ewên welatê xu difiroşin?!Ewên giyanê xelkê xu dikine dular û libankên eropa diveşêrin?!Çima hûn
behsê wa nakin,ewên ter û hişka pêkve disojin?!
Dadwera,devên xu birine bin gohên êk.Çavên xu yên sor lihindek efirîta neqandin.
Werîsekê zifir,jiesmana hate xwar.Kete tayê dargûzeka pîr.
Milên wî girtin,dane ber mist û pêna,libinê dargûzê. Gerdena wî dixilfa werîsî baş
çiklandin.
Herçend dadwera,digel xelkê hejarê welatî serê werîsî kêşan.Heta pêt wî jiaxê bilind
kirîn.
Bêhna wî çik bû,xu gevizand,berevanî jigiyanê xu kir.
Biqêriyeka şêtane,hevalê xu jinav wê xewna dirinde hişiyar kir...

_ Hesen... Hesen.. Texêre..?!
Rûnişte ser cihê xu,berê xu da cihî,zanî vêcarê jî jinav pencên xewneka kirêt rizgar
bû.
_ hey hewar...Eve çi xewn bû?!Eve mirin bû.Ne xewn!
Bibure,min tû jixew hişiyar kirî.
_ mala te ava,heker ez hişiyar ne bam,dibit ez jitirsa dixewda mirbam!
_ jitirsa..?Tirsa çi?!
_ xewneka jiyate kirêt tir!binive dê paşî bûte bêjim.
_ binivim..?Ez newêrim binivim!
_ roj çu nemaye.pêkulê bike binivî,da newastî.
Çav man zîq,bêhinhilkêşana gewriyên wan,dengê firokên şerî jê dihat.Her livîneka
wan,her xu qolpandinek jilayekî bû yê dî.dengê reniya befirê jê dihat.
Dengê dest qotanê jimijulankên wan dihat!
Qotana dergehê jora wan,biriyara dadwerekê rast
Bû.jisêdara xew û xewnên girêt,rizgar kirin!
Wek komanduwa,xu jinav nivînên xu yên lipêş çava wek tevnekê jiagirî vehandî,havêtine der,soz dan êdî ne çine nav wan nivînên pis da.
39
_ spêde baş...Hîvî ye hûn têr nivistbin!
_spêde baştir,nivistinê dil û mejyên tena divên!
_ ne,ez vê çendê jihewe razî nabim.Wek ez dizanim, hûn îraqî û taybet kurd,tuşî gelek
nexoşiya bûyne?! Herdem hûn diserketî û biomêdin.
Turmbêleka kevin û çend pare,hewe jihîvî û jiyanê bê bar nakit.
_ kak Husên...Heval Reşîd rast dibêjit!Heker dê hukî,ez dê bihayê turmbêla te dim û..

_ kuru,sed turmbêl û pêlava te.Min gelek cara,deh car pitir jidest daye,ev cihê em
lê,cihekê pîse.Cihê pûçaye.
_ hilûn,da hewe bigehînme westgehê tirênê.
Hûn dê min jî tûş kin,eve çend saleke,ez yê pîçek biomêd ketîm.
_ bibure,kak Reşîd,birastî me tû wastandî!
bikeniyeka dilveker,destên xu bilind kirin..
_ ez gelek pêxoşhal bûm min hûn niyasîn.
Berî çend heyveka,ez jî lielmaniya toşî nexoşiyekê bûm,kabirayekê kurd û jibajêrê
hewe,û xelkê welatê hewe,limin bû xodan,ez jidestên polîsa rizgar kirim,û bihayê
bilêta min jî da û ez hinartme mal.
Anku,eve qenciya wî kurê kurde,ez nihu liser xu radikim..
***
Pirag...Wek kiçeka sinêle,pirç zer,jixew radibit.
Pirça wê ya ne şe kirî,biser milên wê da şor bûye.
Pitir mêyatiya wê diyar dikit.
Pêhina şevên kes û sor,jihemû kulana diêt.Herkesê,nan û ava wan vexwar,neşêt
gelek dûr kevit.
Sed qeda biher hevit birayên wê yên rût û zirtek bikevin.
Kes neşêt,bisanahî wê pirça bijale şe kit û wan rûyên nazik ramosit.
Divêt baca wan bidit,divêt bihayê ciwanyê bidit.
Welatekê seyre..Pêşketin,mirovayetî,roşenbîrî.
Lê birsê û bêkariyê tuşî gelek şaşiya kirîne.
40
Dizî..Dikuşa biyaniya da nivistin..Tiştekê berbelave.

_ bila bû te dinav dû nana dabit..Pirag!
Nehêla dengê wî bigehite gohên hevalê wî.
Hevalê wî,yê digel sîmerxên hizirên xu zifiriye Wê roja kelexê herdû hevalên xu
hêlayne lixesta pirag.
***
_ navê te?
_...
_ welatê te?
_....
_ tu van diniyasî?
_...
_ kê ev kare kiriye?
_...
_ divêt tû biaxivî,heker dê ev gonehe kevite ser te..
Dibit te ew kuştbin!Erê..Ma kî wan diniyast?
Te bû kuştin?!
Berê xu da nav çavên wî polîsê boz û çav şîn.
Serê xu hejand,hindek gûtinên wî gehiştin gohê wî..
_ bibure,heker tû harî me nekî, em nagehin rastyê,em çu nizanin!
Polsî berê xu û pirsiyarên xu dane wî şofêrê wê şevê digel Hesenî,ew kelex înayne
xestê..
_ û tû?Te liwêrê çi dikir?Tû çi dizanî?!
_ ez birêya xu diçûm mal,ev kese wek har û dîna hate pêşiya min û rê limin girt,min
hest kir ku dize,lê piştî ez jiturbêlê kêşayme der,min zanî wî harîkariya min divêt.

_ ê..?
_ min û wî,kelex havêtine diturmbêlê da û hatine xestê.
41
_ û paşî..?Direnge,hewe ez şêt kirim?!
_ ez jivê zêde nizanim..
_ kes liwara nebû?Te goh lidengê golla nebû?
_ nexêr..Lê min divêt bêjim!
_ bêje..Her tiştê tû dizanî bêje!
_ heker vî kesî ew kar kirba..Dişiya gelek bisanahî xu veşêrt,kesê çu jê ne
dizanî.Wesa diyare,eve hevalên wîne,yan mirovên wî yên gelek nêzîkin?!
_ ez jî wesa bawer dikim,lê divêt baxivit,tiştekî bêjit,harî me bikit,ew dîdevanê
bitinêye!
Dengê çûna turmbêlê sist bû,hişên wî cemiyan.
***
_ eve em gehiştin westgehê,kerem kin.
_ malate ava.
_ divêt tû bû me bilêta jî bikirî..
_ ne tirsin,heta tirêna hewe birê nekevit,ez hewe nahêlim.
_ hîviye,em bişên rojekê qenciya te liser xu rakin.
_ tinê hûn belênê bidine min,ku hûn vê şev û rojê jibîr bikin,bila çu ciha didil û mejyê
heweda ne girt..
_ jibîr kirin..aax,heker jibîr kirin neba?Da çi ête serê mirovî?!
***
(iha livêrê bû..Eve şûn gevizka wane,erê iha livî cihî bû!

Eve hêşta cihê golleyên wane liser vî dîwarî..
iha ketine vêrê..Eve şopa xwîna wane..Hêşta tijî difinên mine!
Erê...iha liverê bû !)
42
***
Westgeh kun mêriye.çend xelkê wî bajêrî liwêrê kum bûye.Jiyan dikuka livîn û karî
daye.
Liser hejariya wan,jiyaneka xoş,bikeyv û kenî dibûrînin.
Xemla kiç û jina,serinc rakêşe,mêyatiya wan ya aşkira ye,jidûr gazî dikit.
Ne kiras û vistanên bihizara,ne sorav û spiyavin.
Ne kil û qayîşên zêrîne!
Çu pismam û kurxal,zêrevaniya wan nakin.
ne xwastyên çu kur axa ne.ne dilandikê da likurmamê hatiye mar kirin.
Gelek disadene,gelek diheval xoşin.
Tinê penteronekê kabûy,kirasekê sade,pirçeka zer, bisanahî serda diberdin.
Zû razî dibin,zû sil dibin.Mara wan,cigarek û perdaxeka bîrêye.
Daxwaza çu next û nîşaniya nakin.daxwaza çu qesir û navmalyê nakin.
Xwandevane,şarezane,evîndarên jiyanê ne.
Çu mavên xu yên siroştî jidest nadin.
navê çu seruk û rêbera nizanin.
Hejariya wan liberamberî welatên dewir û bera,çu jiberxudana wan bû jiyanê kêm
nekiriye.
Kes hest biwê cawaziya mezin dinavbera wan û cîranên wan yên xudan şiyan da
nakit.

Tinê,qeda bihejariyê bikevit,bibê kariyê bikevit.
Dizî,ya bûye vayrosekê berçav,gendelî ya bûye persîv jidifna polîsa şor dibit.
Divên wek cîrana bijîn.neşên bihayê jiyanê kum bikin.Nevên jiwan kêmtir bijîn,tuşî
karên ne asayî dibin.Yên dihevrikiyeka mezin da dijîn!
_ helw..
Liser milê xu zifirî,dû çavên jirengê deriyay,pirçeka jidavên rojê,dêmekê jibefir û
xwînê,bejin jiştla spîndarê..
Bilêvên sor qurmzî,liber tenişta wî,cih tijî kenî û bişkurîn kir!
43
Lal bû,nezanî dê çi bersiv dit.
_ helw..Min gût helw?!
_ ê.. Ê.. Helw, keremke?
_ tû keremke..Tû lihîviya çî?
_ lihîviya hevalekî..Dê bûme bilêta birt.
_ dê kîve çî?
_ elmaniya..
_ ow..Cihê daxêye, dê pirag hêlin..
_ divêt em biçin!
_ bû divêt? Ez hez jipeyva divêt nakim!
Bimîne..Çend rojekên dî lime bibe mêvan,elmaniya na
revit..ow..Elmaniya..Ez
evîndara elmaniya me.
_ lewa tû elmanî baş dizanî..
_ ez têra jiyanê dizanim..Tû lielmaniya dijî?
_ erê..

_ bitinê...?Yan..?
_ ez bitinê me,min çu kes nînin.
_ heker tû xu bigirî,çend rojeka bibiye mêvanê min, dibit ez digel te bême
elmaniya..ow elmaniya..
Çend şirîn û giyan sivik bû,pitir lê hat.Demê peyva elmaniya jinav lêvên wê derdiket.
Jinûve elmaniya liber dilî xoş û şirîn bû,jinû bihayê elmaniya zanî.
Destekê req,milê wî girt.
_ were,nedemê wê ye,dê tirêna me çit..
Jiber sîngê xoştiviya wî îna der,jiber tenişta bûka êkşevî,îna der.
_ heta dîtineka dî..
_ te telefon heye?Nav û nîşan hene?
Destekê wî Husên kêşa û êk ma didestê wê kiça wek qevteka gola da.
44
Diwê gavê da,jidil diviya bibite dû.êk digel Husên û xemên wî bizifirt,û êk bikefite
davên pirça vê horiya jipaxên biheştê derketî..
Xu giran kir,xu mijûl kir.Keniya Reşîd cezayrî,hizirên wî cemandin.Destê xu jinav wan
tilên xeyzeranî û nazik, kêşane der,ne jidil xatira xu jê xwast..
_ bibure,em gelek bikarin,lê soz bit em bizifirin..
_ dê çewa te bînim?
Husên bersiva wê da.
_ yên wek te tijî piragin..Heta dîtineka dî..
Lêvên xu gezandin,dêmê wê evîn jê dibarî..
Piştî çend gaveka,dinav pêlên mirovan da berzebû. Hizir û mejiyê û dilê wî digel xu

birin.
Rê nedît,ew xema girana şivêdî nehêlay binivit,jibîr kir.Gelek cara lipişt xu zifirî,kes
nedît.Hind ageh jixu bû, dergehê tirênê lê hate girtin,digel xu beref elmaniya bir.
Bû cara dawyê,Reşîd cezayrî,xatira xu lipişt pencera tirênê bibişkurîneka nixaftî jê
xwast!
Licihekî vala roniştin,herêk jiwan diviya bizutirîn dem bela hevalê xu jixu vekit,da
bigehite govenda hizirên xu yên ser û mejî lê kirmî kirîn.
Herçende,dengê wan zirtolazên her êk kiçek dikuşê da û digel hatiye geriyanê,reva
kotirên hizirên wan diverevand,her neşiyan bînine ser rastiya jiyanê!
***
_ ka turmbêla te?
_.....
_ te firût?Pa ka çakîtê te?Ka tiştên te?
_.....
_ texêre?Bû bersiva pirsiyarên min nadî?!
_ turmbêl çû..
_ kîve çû?!
_ ma min negût,bes pirsiyara bike!
45
_ divêt ez bizanim ka çi liturmbêlê hat?Û ka te xêre?!
_.....
_ ez bila xu jite venakim,heta rastyê bizanim!
_ rastî !Tû êk pirsiyara dî bikî, dê tijî devê te xwîn kim!

_ tijî devê min xwîn bikî! Serê min jê bikî!Divêt ez rastyê bizanim!
Destê xu bire paş,eniya wî bibû kun dûpşik,xuha leşê wî har bibû...
Digel keniya wan tulazên jiwan wêve,bihemû şiyana xu,kire hewar..
_ turmbêl çûw,tû jî here..Telaqên te....
***
Ew mirovên diwê fargona tirênê da,hemû înane ser hişên wan,bê deng kirin.Çavên
hemûyan man licihê deng jê hatî.
Şerm jixu kir,xuha leşê wî zêde bû,lerzikê girt,bîstê wî sor bû,zer bû.xu kire qormik
dinav kursîka xuda..
Hevalê wî destê xu dana ser milê wî,biçavan berevanî jişerma wî kir,derdê wî baş
dizanî..
Careka dî,her êk çu dîwana hizirên xu,piştî hindek hizirên dî lê zêde kirîn.
Hevalê wî pişta xu da kursîka xu,çavên xu jidil neqandin.
_ ey hewar..Eva min dîtî,heker rastî ba!
Da çi ête serê min?Dawya jiyana min da çi bit?
Wesa diyare,Husên jî xewneka hosa kirêt dîtiye.
Ew qêrî û hewarên xewneka dirindene.Xudê xêrikit...
***
_ tû mirovekê direwînî..
_ tû mirovekê bê wefayî..
_ te hevalên xu jibîr kirin.
_ te gûtibû,ez çucar hewe jibîr nakim.
46
_ te gûtibû,ez çucar na ême pirag.Pirag limin heram bit.

_ te gûtibû,ez dê çime malên hewe,ez dê dayk û babên hewe bînim,dê rastyê bû wan
bêjim!
Serê wî tijî pirsiyar bûn,her pirsiyarekê diser da hizar deng vedidan.
_ hîviye hûn bihêlin ez berevanyê jixu bikim.
Min çucar hûn jibîr nekirîne,hewe jiyana min ya kiriye filmekê tirs û xwînê..
_ bes direwa bike,tû jî wek hemûyan yê fêrî direwa û xoşiya bûy.
_ piştî wê rûdanê,min xoşî yên jibîr kirîn.
_raste...Tû baş yê fêrî direwa bûy,wek hevalên me yên xebatê..
_ hewe çi jimin divêt?Ez çi bû hewe bikim?!
_ em dê dadgeha te liwî cihê em lê hatîne şehîd kirin kin!
_ dadgeha wî ya kiriye.Tinê dê biriyara dadgehê bicih înin.Divêt wek me bête golle
baran kirin,liwî cihê em lê hatîne şehîd kirin...
_ lê ew na bite şehîd!
_ ne, ew ne şehîde..Ew direwîne...
Hest kir,hevalên wî yên xebatê,dê biriyara dadgehê bicih înin.
_ ne bextê hewe û yê xudê,wê nekin,min hûn jibîr nekirine.
_ min bawer nedikir,tû mirovekê hosa tirsinûkî.
Ma ne tûbûy,çu çeperên dujmina liberte asê nedibû?
_ ez jimirinê natirsim..Tirsa min bêbextiye,mirina birûreşiye.
_ te direw kir,tû hatiye pirag,te em jibîr kirin,tû nizanî ka kelexên me likîvene...
_ ê.. Çi bêjim..
_ çu direwên dî neke,em baş dizanin ka tû hatibûye çi!
_ ez hatibûme wî cihê hûn lê hatîne şehîd kirin,min jidil rondik barandin.
_ lê tû ne jibe me hatibûy..

_ em neşên digel te dirêj kin.
Milên wî girtin,pişta wî dane wî dîwarê hêşta şûna golleya liser.
Berê dû kilaşînkufa dane sîngê wî yê tijî hîvî û xem...
47
Berî deng jidevê kilaşînkufên hevalên wî bêt,dengê Husên jiwê xewna kirêt hijiyar kir.
Neviya binivit,ne wêriya çavên xu danite serêk.
Tirên ya dibezit,rê ya berevanyê jimana xu dikit,dem yê rawestiyaye,bê giyane,nalivit!
Tirs dirindekê zale,hevalcêmkê jiyana wane,diêk roj da bûyne,û pêkve dê mirin.
Kuntirol hêşta ya may,Husên yê bê kaxeze.Polîsên van welata çu ezmana nizanin.
Tirên rawestiya,rengê wan zerbû.
_ pasport..
Berê xu da navçavên polîsî û yên hevalê xu.Daxwaza harîkariya wî kir.
_ bibure,turmbêla me lipirag hate dizîn,pasporta hevalê min dinavda bû,digel hemû
kaxezên wî..
Bikeniyeka sar.
_ keremkin,werine xwarê..
_ 6 _
Gelek cara lidewr û berên xu nêrî,biçavên tijî tirs.
_ divêt em dihişiyarbin!Divêt me ageh jixu hebit!
Hevalekî bikeniyeka sivikve gût.
_ livan welata jî divêt em bitirsin?!
Pitir jinîveka hevala,serên xu hejandin,bersiva wî bierê dan.
_ Erê...Dujminê me xodan parew hevale!

Dengekê,bêhna tirsê jê dihat,gût.
_ hewe goh lê nebû,serokê mafiya dujminî berî çend rojeka çi digût?!
48
Pirsiyar,wek narincûkekê dinav hizirên wanda peqî,
Gohên hemûyan bel kirin!
Geleka cihên xu xoş kirin,lez lixudanê pirsiyarê kirin.
Bêhna wî jiya hevalên wî teng tir bû,wî jî diviya zû sohbeta xu bikit.
_ digût...Em şanazyê bixu dibin,dûjminên me neşên liçayxane û meyxanên pirag jî
bixirabî behsê me bikin!
_ raste..Lê divêt tirs rê liber me berze nekit,armanca me jipêş çavên me nebit.
_ nexêr..Ez we nabêjim.Ez dibêjim,divêt me ageh jixu hebit,baweriya xu bihemû kesa
ne înin.
_ raste...Berî çend rojeka,sîxorên dujminî,kiropeka mezin ya partiya kumunîst libexda
aşkera kirin,serçavkên wan,pirag bû!
_ erê,gelek nav livan welata diêne aşkera kirin.
Çi bixwîngermî,çi bixiyanetkarî..
_ şoreşa me,rêya wê dirêje.Em pêtivî hevalîniya hemû tex û çînên milletê îraqê
ne,divêt em digel hemûyan
hevalbend bin,dibit lirojekê pêkve disengerê xebatê
da şerê êk dujmin bikin!
Dibit lirojekê deshelat bikevite didesê wanda!
_ bibure Mamusta,erkê me çiye?
_ peywendiya hewe,divêt ya nihênî û snordar bit.

Hevalên xu bû kesê diyar nekin.Taybet ewên liwelatî.
_ erê Mamusta?!Piştî çend dem hijmêrên dî,em dê digel,gelek reng û deng û partên
îraqî kum bin.Helbet em dê bû wan diyar bin,dê me hemûyan niyasin?!
Û wek em hemû dizanin,ewên amade,ne hemû
şoreşgêrin.Sedased,gelek çav û
gohên dujminî dinav da hene.Û..
_ bibure,axivtina te raste,jiber wê çendê,dê
beşdariya me ya sinurdar bit.
Em ewên bû dujminî aşkira,dê beşdar bin,ewên hêşta ne diyar,divêt her dûr
bimînin,em dê lirojên tengav pêtivî wan bin.
_ gelek başe..
49
_ lidawyê,min divêt bêjim,piştî kumbunê,em dê livî cihî dîsan kum bin.
Heker kesê çu pirsiyar nebin Verevin?
_ 7 _
Wek pêzanînên min liser welatê hewe...
Ê...Kirdistan..Mane kirdistane.Hûn dibêjnê kirdistan?!
_ erê..Kurdistan!Me sedan hizar şehîd daye jibû wî navî..
_ bibure,biburin,ez digel xebat û daxwazyên heweme, tinê min diviya bêjim!Wek ez
dizanim kurdistan pitir ya tenaye.Ne wek parçên dî yên îraqê?!
_ erê,ewjî jiber milletekê hişiyar û dil sozin.
_ pa bû hûn nazifirin?!
_ pirsiyareka dicihê xu daye!Gelek eger hene!
_ wek çi?!Bibure,min divêt bizanim ka ew eger wek egerên me cezayriyane?Yan

hewe hindek astengên dî hene?!
_ ma egerên hewe çine?Hûn jî tijî diniyayê bûn!
_ bêkarî..Birs.. Berîkanê jibû parew desthelatdariyê.. Ciyawaziya mezin ya hizirî..Em
cîranên ewrupa ne!Ew hizar sala liberî mene!
_ egerên me êkin..Xebata çendîn sala..Şehîd û mal wêranî..Hemû bûne pare û kursîk
û berjewendiyên hindek kesên nezan û şoreş nedîtîn!
_ weye..Me liwelatê xu pitir jimelîwn şehîda dan.
Nihu her ew xudan şehîd dibirisîne.Her şoreşgêr jibîrkirîne.Xodan pare liher dû kuza
diçerin.
Wek mişarîne,bû serê dixwîn,bû binî xwîn!
_ wesa diyare,lewma eve paşeroja gencên cezayriyane!
_ hemû welat,dixoşin,tinê mirovin welata nexoş dikin, dema nezan cihê zana digirin.
_ em jî kuvandarên welat û gelê xu ne. Me serkirdên hêja û bikêrhatî hene,lê jiyan
hûye,ewê rast û dirust karbikit,dê ête jibîrkirin,dilên sax nagehine çu Miradan!
50
_ gelek cara babê min digût,livî welatî,geleka nan jidevê biçûkên xu înaye der û bû
Şoreşgêra hinartiye geleka tulazên xu biçek û cil û berg kirîne û hinartîne şoreşê...
_ weye..Kesê wekû kurdan şoreş neviyaye.Kesê hindî wan qorbanî nedayne.

_ me kurdan,Kurdistan jigiyanê xu xoştir divêt, çunemaye me gorî nekirî..
_ herçende,ew wastiyana me,roj bû rojê diête jibîr kirin,lê ez bawerim û min nevêt
jipêş bêxemiya wave hêceta bigirim.Dibit jiber şer û durpêçên abûrî! Seruberê îraqê,neşên gelek tişta bikin.Hêşta em dibin destin...
_ bin destiya çi?!Mala te,eve deh pazde sale em desthelatdariya xu dikin,kes çu may
dikarubarê me nakit.
_ nene,bawerbke,em neşên nanî bêy hindek layen û cîrana bixon!Hemû dujminin,dujmin!
_ û çare?!Heta kengî em dê libin rehma wan bin?!
_ heta ga bizêt!
_ erê..Liserdemê şoreşê,digûtin bêhna xu fireh bikin,
şoreşe..Liserhildanê
gûtin,serhildane û dujmin yê hare..Lidestpêka hukmetê gûtin,hukmeta savaye û
sedam yê saxe..Lişerê birakujyê gûtin,şere û nexoşiye.. Lipêkhatinê gûtin,dû
hukmetn..
Nihu dibêjin pirsgirêk libexdaye.Sobehî dê bêjin,heta em têr bin!
_ helbet,çucar têr nabin.Lê divêt mirov pê bextyê nekit.Azadiye,gelek jidagîrkerekê
bê dil baştire!
_ erê..Ew şoreş û qorbanî,nebû vê bitinê bûn.ligelek welatan çu dagîrker nînin,lê
jiyana wan wek duzexê ye!

_ liwelatê me,jiyan başe,Kurdistan ya berew baştir diçit.Hîvyên me dimezinin!
Me gelek tişt didemekê kêmda divêt!
_ jiber wan nexoşyên me dîtîn,jiber wan şehîd û qorbaniyan.em diheqin!
_ erê,lê nabit em bêhna serkirdên xu teng bikin.
Ewjî wek me mirovin,û jime pitir diwastiyay û bihîvîne, barê wan gelek jiyê me
girantire!
_ gazinda me jiwan kesên hatîne ser qazanê ye,bêy wastiyan.
_ raste..hindeka şoreş nekirîne,lê xûdan şiyanin.Nabit bêne jibîr kirin.Welat welatê
hemûyane.
_ jigazindên hewe diyare, Kurdistan jî wek cezayrê şêl û bêle..
51
_dibit,lê eve hosa Namînit,em yên berev pêşvediçin,roj bû rojê,genc û zana yê cihê
xu digirin.
_ heta em bimirin, biçûkên me wê xoşyê nabînin.
_ nene,we nebêje. Pêşmerka xebat bû kesayetiya xu nedikir,lihîviya çu xelat û para
nebûn.Tinê hîviya wan welatekê azad û serbexu bû,jibû wan û biçûkên wan.
_ nûke turmbêla me çu mane?
Kenî tijî dîwana wan bû,babet hate gohorîn.
Reşîd diviya pitir keniya wan bînit..
_ tû pirsiyara turmbêla xu dikî..Hevalê te pirsiyara wê kiça ciwan dikit!
Ez pirsiyara hewe dikim.Ez bû hewe çi bikim?!

_ min turmbêlal xu divêt..
_ û te?
_ wek te gûtî..Min ew kiça ciwan divêt..
Kenyê rengê wan sipî kir.
Reşîd cezayrî,bidilekê xemgîn ve gût.
_ ez jidil dibêjim,xuzî min şiyaba daxwazên hewe bicih bînim!
_ bibure,em sohbetê dikin,te çu liser xu nehêla.
_ em qenciya te çucar jibîr nakin,zor supas.
_ 8 _
_ biburin,ew herdû birîndarên şivêdî çi lê hatin? Likîvene?!
_.....
_ dixtur..Dixtur..Ew hevalên min yên şivêdî çi lê hatin?
Destê xu dana ser milê wî,bire dijoreka biçûk û lêkday ve!
52
_ tû wa diniyasî?
_ erê..Jigiyanê xu baştir!
_ ê...Bibure,êk nemaye..Û yê dî...
_ heware...Kî jiwan nemaye?!Kî miriye?Kî saxe?
_xu tûre neke,eve qedera wane.
_ min divêt yê may bibînim..
_ geremke digel min were,lê divêt tû bê deng bî.
Neşiya xu liser piya bigirt,xwîna wî hişik bû,tinê dû çavên zil xu diserî da zîq
dikirin.Dû lêvên hişik û qeşavî dilerizîn!
Dixturî derê joreka biçûk vekir.Tijî amîru sondene. Kelexekê mirî dinaf lifaf û pilastera
da rapêçaye.
Ew amîrê lihindav serî,şûna dilê wî xu diqotit,bêhna wî biser diêxt.

Lihindav serî rawestiya.Hişik ma,kete zifirokeka kûr...
***
_ hûn markisyên kurd,jibû çi xebatê dikin?!
_ markisyên kurd?!
Keniya wî tijî wî gelyê bidarubar bû.
_ erê...!Hûn kurdin,û markisî ne.
_ nexêr..Em mirovin û markisî ne.
_ ma kurd ne mirovin?!
Dîsan kenî,û jidil kenî lê jitirsa hevalê wê ture bit,zû xu bû bersivê amadekir.
_ kurd babê mirovane.armanca me êke,lê rêya me cûdaye.
_ bibure heval,ez tê negehiştim!Jikerema xû bû min şirove bike.
_ dê were rone û wê perdaxa çayê bide min,da serê min tena bit,dê bû te jiserî..Heta
binî fêra çim!
_ kak Hesen..Hişiyar be!Eve te diser rê da nebit!Gelek yê lidûr te dizifirt.
_ wela heker armanca me êk bit,wek ew dibêjit!
53
Ez amademe bibime hevalê wî..
_ wey tû gelek bixêr hatî.
_ dê bêje,yan bêy ça na ête gûtin?!
_ bêy ça,çu tam têda nîne.
Keniya liser lêvên wî,serinca dixturî rakêşa,Zanî yê digel wî bihemû hest û giyanê
xu.jor bû wî hêla û derket..
_ em dizanin xebata me jibû çiye.Me welatekê azad û serbixû divêt.Me azadiya gelê
kurd divêt.

Hewe çi divêt?Hewe divêt diniyayê hemûyê rizgar bikin?!Ez nizanim hewe çi
divêt?Hûn liçi digerin?!
_ belê tû baş dizanî me çi divêt!Te gût..
Me divêt diniyayê rizgar bikin.Bawer bike,heta aştî û azadî lidiniyayê hemûyê belav
nebit,milletê kurd rizgar nabit.
_ heta hûn aştî û azadyê lidiniyayê belav dikin,dê pêt me bine cût!
_ ça te geleka xoş bû,niza te çigareka wesa xoş jî heye?
_ ça,bihayê wê pirsiyara min bû!çigare bihayê çiye?!Hemû tiştên hewe biberamberin?
_ ma jihevalîniya me bibihatir heye?
_ kes neşête hewe bû ezmanî.Nexêr jihevalîniya me bibihatir nîne,lê xuzî tû hatibay
ser riya rast.
_ ez jî her we dibêjim,xuzî kak Hesen hatiba ser riya rast.
Kenî tijî wan kun û qolaçên asê bûn.
***
Dengê dergehê jorê,hemû hevalên wî jidûra revandin.
Kiçeka ciwan,bidev û lêvin tijî kenî hate jor.
_ bibure,nabit tû gelek lihindav serî bimînî..
Hate ser hişên xu..
_ ez çu denga nakim,tinê min divên lihindav serê wî bim.
_ bibure,nabit,nihu dixtur dê êt,divêt tû jijorê derkevî!
54
_ ez dernakevim,bila dixtur bêt.
_ lê hosa nabit,bû wî nebaşe..
_ ez bawer dikim,sebra wî gelek bimin dêt!

_ wî ageh jixu nîne!
_ tinê ageh jimin heye.
Berê xu da navçavên wî,zanî derketina wî ya bizehmete.
Destê xu da wê çekmeça birex textê azad liser dirêjkirî.Hindek kaxez û wêne înane
der.
_ eve yên wîne,dipaxla wî da bûn,tû dişê digel xu bibî.
Herwekû narincûkeka kilîl vekirî kiriye didesitî da,haha dê dinav destanda peqit!
Ew kaxer û wêne,jinav wan destên nazik û sipî înane der.Liber tenişta textê azad
ronişt ser erdî.
Kaxez û wêne têkvedan.Çavên wî biwênê kiçeka ciwan û xemilandî ketin.Bişkurîna
dêmê wê,tijî diniyayê bibû.Lipişta wêney,nivêsî bû..
(azad..Ez libenda teme.Ma tû nazifirî?Min soz daye mêra nekim.Bijîm bûte me,bimirim
bû axa welatî me. Xuştiviya te jiyan..)
Neşiya xu,tijî gewriya wî girî bû.
Wênê wê pîrejina lêkday,hevrikî digel giriya wî kir!
Lipişta wêneyî nivêsî bû (kurê min azad,çavên min lirêya te tarî bûn,ez çavê te maç
dikim,hîviya sax û silametiya te û hevalên te dixwazim.Were..Min divêt berî bimirim te
bibînim,berî bimirim bejna te himbês kim,eniya te maç bikim.Were..Ez gelek
nesaxim,dibit tû min nebînî!Lê hîviye xû biparêzî,gerdena te aza..)
Serê xu dana ser lêva textê azad,kete dixirîkêna giriyê da..

Çavên xu vekirin,tijî hindav serî dixtur û sistir in..
_ çi bûye?!Ez likîve me?!
_ silametiye,tû mêvanê meyî!
_ mêvan?!Jiber çi?Çi limin hatiye?
_ tû pêçek gêj bibûy,lê sopas bû xûdê,nihu gelek başî.
_ ez dişêm biçim?
_ dê kîve çî?
55
_ min divêt biçime nik hevalên xû!
_ bila dixtor bêt,paşî.
_ ê..
_ bibure,em neşên bêy dixtorî izina te bidin.
_ ez dişêm pirsiyarekê bikim?
_ keremke?!
_ çi liwî hevalê min yê dî hatiye?
_ divêt ez pirsiyar bikim.Navê wî çi bû?
_ Elî..Elî necefî
_ alî...Aly negefî...
Dest da telefonê, digel cihekî axivt,dîsan gût,alî negefî..
Berê xu da wî,ka nav dirust gût!
Telefon dana û lê zivirî..
_ ew tiştên digel wî,yên lipirsgehê,kelexê wî yê dinav tezîngehê da libenda êk wergirt!
Diniya hemû bû bar,kete ser milên wî,çav lê zîq kirin, tijî dev û difina kefa sipî bû.
Sistirê zanî karekê şaş kir,zanî axivtina wê golleka topê bû,ser û mejî lê hêran.
Kire hewar,dîsan çend sistir û dixtorên liwara lê kum bûn.

Leşê wî perxandin,ava tezî lê reşandin,dermanik dane ber difna wî...
_ nihu tû baş tirî?
_...
_ bêhna xu fireh bike.Vê hepkê bixû digel hindek avê, dê êye ser hişên xû.
_ ka ew tiştên wî?
_ tiştên kê?
_ yên Elî necefî..
_ tû yê wastiyay,dê paşî bû te înin.
_ min nihu divên..
_ başe..Xu ture neke,dê bû te înin.
Sistirekê qesta cihê tişt lê kir.Qefteka kaxez û wêna kire didesitîda.
56
Kuma wan veda,berekê pan kete ber desta...
***
_ Elî...?
_ belê..Keremke?!
_ ew çi bere digel te?
_ eve berê(turbe ye)
_ te jikîve înaye?
_ ji necefa şerîf.
_ willa ez bawer nakim!
_ belê bawer bike.
_ te bû digel xo înaye..?
_ tuberke,nivêj bêy wî naêne kirin!
_ mala te,eve jiberî hizar û pêniçsed sala libiyabana bikar diînan.jiber xîzî,da eniya

wan nekefte dinaf xîzîda, nihu tû liewropay,eve pirage,pirag,ne biyabam ne?!
_ liherchê mirov nivêjê lê bikit diête bikar înan.
_ te ne gûte me?Te çewa likuntirola derbaz kir?
_ ma ez çewa derbaz bûm?!
_ rast...?Jinecefe?Yan jiwî robarê tû her roj diçiye ser jiber jinkên nîv royis?!
Keniya azad bilind bû û gût.
_ heker jiwêrê bit..Eve gelek yê pîroze!
Hemû pêkve kenîn,keniya wan leşê wî bijiyan kir.
***
Recivka leşê wî,hizirên wî jihevala dûr kirin.
Lez liwan kaxeza kir,ligiyanê wî geriya..
57
Yê dinav kumeka mirovan da rawestiyaye.
Lirexê rastê,jineka ciwan bicilên erebî rapêçaye.
lirexê çepê,kurtulazekê sinêleye.Lirexên wan dapîr û bapîrên,dikuka xoşyê da
dirawestiyayne.
Li hindav serê wan,wêneyekê îmam Elî bidîwarê malê ve hilawîstiye.
Hemû yên lihîviya wî,çavê hemûya yê lilivîna wî qeramê dinav gomên avê da.Gohê
hemûya ma lifirîna balindekê avî.
Dibit,lipişt wê qefta qeramê he xu veşart bit?!
Dibit,piştî livîna kuma qeramê he,serê xu jinav wî pûşî bilnd bikt û bête nav zincên
me yên jileven û qeramî dirust kirîn.
Dibit,ev şeve liber tenişta dayka heîder binivit!

Devê hemûya tijî keniye,hemû yên lihîviya wî.Hemû çaverê ne!
deng jiwî wênê biçûk hat,kiçeka dûsê salî.
_ ka babê min?Vê carê gelek gîro bû?
Piştî ava goma hişik kirîn, piştî qeram û pûş sotîn.
Êdî lime nabit mêvan?
Ka babê min? Çi lê hatiye?Dê kengî zifirt?!
Dizifiroka pêlên pirsiyarên wê da xendqî.
Bilez wênê wê kire dibin hemû wênada.
Çavên xu neqandin,bêhna xu çik kir,ma lihîviya dengê wê..
Bê dengyê çih dagîr kir,tinê deng jihindek amîrên jiwî wêve dihat.
Neviya çu kaxezên taybet bixwînit.
Dibit navên hevalên wî yên rêkxstinê têda bin?!
dibit nameka evîndarî jixêzana wî dinav da bit?
dibit hindek huzan,yan bîrhatin yan peyvên wî yên taybet dinavda bin!
***
Tû dizanî Gomên me yên avê,wek çiyayên hewe
58
Ne?!
Bi keniyeka sivik..
_ çiya likîrê?Û gom likîrê,malate?!
_ belê!Hûn xu liçiya xudan dikin û xu diparêzin,em ligoman!
_ ha?Wesa ?
_ erê..Heker me jî ew gom neban,dibit nihu em diqirkirî bûn.Wek çiyayên hewe,ewên
hûn jidujminan parastîn.
_ ne tinê çiya em parastîne.Mêraniya me,û nanê me,û mejiyê me em parastî ne.
_ dujminê me,ne mêraniyê dizanit,ne nan û mejî,

dujminê me dirindekê hare..
***
Dengê dixturî û herdû sistirên digel da,heval jikuçka wî revandin.
_ demê te baş..Nihu tû yê çewanî?
Sistirekê persiv da..
_ gelek yê başe,dişêt biçite derê..
Dixturî berê xu da wê sistira diaxivit,û diberra hindek kaxez têkve didan.
_ kaxezên wî dirust bikin,hindek dermana bidinê û izna derçûna wî bidin..
Dest da hindek kaxezan.
_ bibure,jiber tû bitê van mirovan diniyasî.Tû dişêy kaxez û nasnamên wan wergirî..
Rast rabû ser xû..
_ azad jî mir?
Dixtur kenî,diviya xem û barê wî sivik bikit..
_ nene,azad yê başe,lê divêt bû demekê dirêj livêrê bit.
_ ez dişêm bibînim?
_ her demê te bivêt.
_ min nihu divêt!
59
_ bibure,nihu yê nivisitiye,nabit hişiyar bit.
Zanî nivistina wî dê dirêj bit.Kaxez jidestê dixturî wergirtin.Û liser kaxezeka dî îmza
kir.
_ derbarey leşê Elî necefî,te çi rêk,yan pêşniyar hene?Çi lê bikin?
***
_ heker ez livan welata mirim,min liber lêva gomeka avê veşêrin,leşê min lixu nekine

bela,bû mala min ne hinêrin..
_ ji ber çi?!
_ ez dizanim,jiber çiye!
_ kes nizanit..Jiber çiye.
_ belê..Da dayka heîder şû nekit..
keniya wan ser jixemên wan stand..
_ ne,bawer bikin,da keyva dujminî ne êt,da nebêjin, eve êk jişoreşgêra kêm bû...
***
Dixturî zanî hizrên wî dûr çûn,destê xu dana ser milê wî..
_ eve qedera wiye,gel bivan rêya digehine azadyê..
Axivtinên dixturî xwîna dilê wî êxiste karî.
_ te çi gût?Em çi lileşê wî bikin?
_ min giyanê wî diviya..Leşê wî bila bû hewe bit!
Pişta xu da wê xesta baştirîn hevalên xu lê hêlayn.
Êk wek kumeka goşt û hestiyan,yê dî lihîviya îsa pêxember jiesmana peya
bibit,bidestê xu yê pîroz, birînên wî vemalit!
neşiya jixestê dûr kevit,lirex û durên wê dinivist, dixwar.ew baxça birex xestêve,bibû
mala wî.
Jora xu hêla,hevalên xu hêlan,jiyana xu jibîr kir,çu tişt neman lipêşiya wî,tinê hizir û
umêda wî bû ew demê lihindav serê hevalê xu azad dirawestit!
_ bibure,evro leşê hevalê te,Elî necefî licihekê taybet bi islamêve hate veşartin..
60
_ supas..Bû hewe hemûyan.

_ ê..Min divêt bêjim?
_ keremke?Bêje?
_ berpirsên xestê jiseruberê te ne dirazî ne..
_ seruberên çi?!
_ bibure,tû wek..
_ wek çi?Hema bêje?!
_ sehke xu,tû dê zanî..Ez bawernakim,êdî bihêlin tû husa bêye dixestê ve!
Leşê wî pitir giran bû,zanî dê hevalê xu yê dî jî jidest dit.
Kete dinav pêlên bajêrî da,nivistin jibîri kir,xwarin nema. Gelek şeva liber lêva
cada,dikabîna telefonê da
dinivist.
_ kak Hesen..Kak Hesen..
Serê xw yê giran jinav destên xu înane der,çavên wî ronahî jibîr kir bûn,xudanê dengî
neniyasî..
_ tû kî?Te çi divêt?
_ hilû Mamusta,eve te xêre?Tû mirovekê roşenbîrî. diniya bişehîd bûna dû hevala
xirab nabit.
Milletê me sedan hizar şehîd dayne,her kesê hevalekê wî şehîd bû wek te kir,pa
dujmin liçi digert?!
Êkî dî milên wî girtin,jiaxê bilind kirin.
_ Mamusta,hêşta gûtinên te libîra mene,dema te digût: Şoreş ne bû me bitinêye,dibit
nebû kurên mejî bit,bû nevyên me ye,bû kurên şehîdaye..

Hişên wî cemiyan,ewên lidurên xu,niyasîn.
_ biburin,liwelatî min pitir dişiya xu ragirim.Lixerîbiyan,em yên bê hêz û bê xudanin!
_ te digût,ew welatê mirov azadiya xu têda ne bînit, ew ne welatê miroviye.
_ hilû..Eve ne cih û demê van sohbet û bîrhatinane. Divêt tû baş karê xu bikî,serurîhên xu bitiraşî,hindek cilkên paqij û lêkday bikiye berxu.Me gelek tişt
lipêşiya xu hene,em karî bû bikin,ne demê girî û gazinda ye!
_ raste..Kes bigirî û bîrhatina nagehite armanca.
61
Liwê jora gelek cara digel wan hevala serê xu têve dixwarin,xu têve rûs dikirin,jihizir
û bîran,jikerb û kîna çînayetî,û gelek cara jicil û bergan jî...
Jor ya bêserubere,pîsatî tijî hemû kun û qolaçaye.
Eve demekê dirêje,nehatiye jora xu,newêrt lê binivit, hest dikit,hêşta giyanê Elî necefî
û azad hewlêrî lihîviya wî ne.
_ eve min xu paqij kir,têr xwar û vexwar.Hûn nabêjin hewe çi jimin divêt?Hewe çi
limin veşartiye?
_ Mamusta..!Tû jikesên nêzîkî azad hewlêrî bûy.
bibiriyara şoreşê,tû digel hindek hevala dê beşdariyê dibehiya azadî da kin...
Rengê wî pêtî bû,neşiya xu liser piya bigirt,kete ser nêzîktirîn kursîk,dû hevala
danane ser cihekê baştir..
Jor bê deng bû,hizir neliv man,xwîna dilê wî şer digel okscînê dikir!

Perdaxeka ava tezî bizûrî berdane devî,hişên wî hêdî hêdî kum bûn.
_ azad jî şehîd bû?!
Kesê newêriya bersiva wî bidit.
_ kengî eve bûye?
Berê xu da wî hevalê bivî karî radibit!
_ bibure Mamusta,eve dûsê rojekin!
Tijî nav çava kerb û kîn bû.
_ eve dûsê rojekin!Hûn min agahdar nakin?!
_ bibure,cih nema lipirag,em lê negeriyayn,te xu berzekir bû!
Zanî,jidestên hemûyan derket,zanî biturebûnê nazifirt..
_ nihu hewe çi jimin divêt?Çi liser mine ez bikim?!
_ wek min gûtî Mamusta.biroska şoreşê dibêjit. Mamusta Hesen digel hindek
hevalan,binavê şoreşê beşdariyê dibehiya şehîd azad hewlêrî da bikin!
_ başe..Ez amademe!
62
_ 9 _
Çavên biçûkan bipencera ve şil bûn,leşên wan yên nazik,wastiyan.Ew xoşiya didilê
wan da,ya dibite xewin. Jivê pencerê,diçine yadî.Bi çavên xu yên biçûk,rêya babên
xu kuntirol dikin!
_ babê min dê divî cihî ra êt,eve rêya wî ya hercare.
_ ne,ez dibêjim dê direxê dî ra êt!
_ ma dê çewa diwî rexî ra ên?Nê cihê turmbêla wan nîne?!
_ ha...! Raste,dê êne cihê hercar.Livî rexî..Mane?!
_ erî..Dê bû min cil û pêlavên werzşî û kulavekê ciwan înin,û wî gût min yên kirîn jî...

_ bû min jî dû destên kirasa û tuqew guharika yên kirîn..
_ ma tû ya bê kirasî?!
_ manê tejî çend pêlav û cilkên wezşî yên heyin!
_ dê hişbe..Bila bû tejî bînit...Lê gelek gîro bûn!
_ erê..Dadê jî her we dibêjit!Ez nanivim û na xûm na vexûm,heta ne ên.Bila jibirisa
bimirim!
_ tû mirbay,baş bû,da tû bes axivtbay..
_ erê..Te babû bû xu bitinê divêt.Mane babê min jî ye?
_ ez yê mezinim,berî te babê min bitinê bû.
_ û başî yê min jiye!
Dengekî jipencera dî gût..
_ babu hat...Babû hat..!
Hemû pêkve rijiyan ber wê pencera biçûk.
Dayka cih jibiçûkên xu standin,çavên xu tijî dîmenên bejna wan ya wastiyay kirin!
_ xudê qeweta hewebit.
_ supas..
_ hûn dibirsîne..!Mane?
63
_ tinê me divêt,têr binivin!
_ hewe xêre?!Çi bûye?!
Berê xu dane êk,her êkî diviya yê dî bersiva pirsiyarên wan yên civêl bidit.
_ babû?Ka turmbêla te?
Zenga mejyê wî lêda,cerekê ava tezî,berdane ser leşê wî yê kerim!
Daykê jî xu havête ser birînên wî yên kûr.
_ erê wila,ka turmbêl?!

Çav lê şor kirin,rengê wan zer û pêtî bû.
Biçûkekî dî gût.
_ ka cilkên me?
Yadî gût.
_ ka kirasê min?Ka pêlava min?Ka..? Û...?
Daykê zanî,tiştek jihêza wan mazintir rûdaye,lewma hosa bê huş û deng kirîne.
Libiçûkan xurî,hemû ji jorê kirine der.
_ hişbin,eve ne demê heweye,babê hewe yê wastiyaye,herne jorên xu..Dêyî..
_ em naçin,heta diyariyên me nedite me.
Çu nema liberahiya wan,berê xu dane navçavên êk,zanîn neşên pitir veşêrin.
_ turmbêl hate dizîn!
Hemû şir bûn,bê deng man,bêhna biçûka tengtir bû.
_ û diyarî?!Ka diyariyên me?
Milê kurê xu kirt.
_ kurê min.Ew jî dinav turmbêlê da bûn.
Yê dî gût.
_ diyariyên me jî hatin dizîn?
_ erê..
Yê dî gût.
_ kê dizîn?!
64
Dîsan dayk lê xurîn,çinklên wan girtin,rakêşane dijorên wan ve.Da ew digel babên
wan bidilên xu biaxivin û çîroka wan bizanin!

_kurê min,babê te yê wastiyaye,ne demê pirsiyara ne,ez dê bû te hemû tişta kirim.tijî
sûka me ew tiştin.
_ min tiştên vêrê nevên,min yên pirag divên.
_ carekadî,em dê digel wan çin.Ka te çi divêt,Bû xu bikire!
Dergeh lê girt,qesta babê wan kir!
_ ka bû me jiserî...Heta binî bêjin,eve çi bû? Çewa hate dizîn?Û...
_ kicê jê bigere,bila gorî wan û biçûkên me bin, malê diniyayê ne çiye!
_ erê..Lê min diviya bizanim,çi nexoşî bû hewe ne çê bûne?!
_ ne,em bisilametn.
_ cihekî bû min danin,da ez têr binivim,başî dê bersiva pirsiyaên hewe deh carî dim!
_ hilûn,cih amadeye..
Liser cihê xu yê xuş û tena,xu dirêj kir.Hest biaramyê kir.Xav bû,xu mirand,diviya
binivit,diviya bû demekî hemû tişta jibîr bikit.Jicîhanê dûr kevit,goh likesê nebit, tinê
digel giyanê xu yê wastiyay bimînit.
Dilê tijî hîvî,mejyê tijî hizir.Ew biçûkên lihîviya diyariyên xu.xew lê sil kir,neşiya leşê
wastiyay bibine dîwana xu!
***
_ tû mirovekê bê sozî...
_ tû mirovekê bê dilî...
_ tû her ne mirovî...!
Lirexê rastê,çend binemala azad hewlêrî dikumin. Dayka wî liserê dîwanê,bizotekê
agirî didestdaye, haha dê kite dinavçavên wî ra!

_libinê dîwanê,yara wî,bixemla caranve,gupalê pîrebabê wî jidestan îna der,û
liteniştên wî hate çepa..
lirexê çepê,mala Elî necefî hemû pêkve yên lihîviya mala azad,dema ew jê têr bin,da
bibite gera wan. Hemû diamadene,bimist û çeqo û dar beranve.
Weku aşorayê,xu didine ber mist û qamçiyan û lidur kelexê wî zikirî dikin.
_ te çewa kelexê babê me hêla lixerîbiyan,linaf kafiran?
65
Kurê wî heîder yê mezin bûy,gelek rengê babê xu didit.
_ babê min dinamên xu da digût..Min dû bira yên heyn, ez hest bixerîbyê nakim.
Dayka wî bersiv dida..
_ erê..Her digût,ew min nahêline bitinê,dê min parêzin, ew hevalên man û nemanê ne!
Diviya berevanyê jixu bikit,diviya bêjit..Dem û cih ne diharîkar bûn!
Diviya bêjit..Giyanê min limin bela bû, da çi likelexên wan kim?!
Yara azad,bilewendiyên sorve,hate dîlanê..
_ azad jî digût..Min dû bira yên heyn,gelek jibira baştirin.
Wî nezanî birayê wî,dê kelexê wî lixerîbiya veşêrt,û dê bite êxsîrê nêratiya xû..
Dengê herdû binemala têkel bûn,nezanî ka çi dibêjin?
Ketin dan û stanê.Mezinên wan,serên xu pêkvenan. biçûkan kirine xûpêşandan,lê her
zû gehiştin biriyarekê.
Gohên xu vekirin,diviya bizanit ka çi tevin bû wî diraçînin?
Jinav çavên wan diyar bû,biriyara wan ya dijware!

Diviya biaxivit,diviya berevanyê jixu bikit.
_ nabit tû biaxivî..
_ nabit tû berevanyê jixu bikî..
_ biriyar,biriyara meye..
-- Biburin,min tinê divêt bêjim!
_ hişiş..Ne axive.Nihu dê biriyara me liser te ête xwandin..
Kaxezeka mezin,rexek didestên dayka azad da û rexek didestên dayka heîder daye.
Wek tîpeka hunerî biriyar xwandin!
_ biriyar.Jibinemala azad hewlêrî.Û binemala Elî necefî.
Ev biriyare hatine dan!
Piştî xiyanetkariya te,piştî te berevanî jigiyanê wan nekirî û xu likelexên wan nekiriye
xudan,û liwelatekê sar û biyanî,bêy nivêj liser bête kirin,hatine veşartin.
Piştî em herdû binemal,gelek lihîviya wan çaverê mayn.
66
Me biriyar da,te bidar û beran bikujin û liwelatekê sar û bê xudan veşêrin,da kes çav
lê nekit!
Berê xu dane êk,navçavên wan gorî jê dibarî.
Hemûya pêkve qesta kelexê wî yê wastiyay kirin.
Piştî jiqotan û lêdana wî têr bûyn,dest û pên wî baş girêdan.
Neşiya bikite hewar,neşiya birevit,çav lê zil bûn,hişik û bê deng ma,çu jê nehat.
Dergeh vebû,kurê wî yê biçûk,xu jinav destên dayka xu îna der,xu havête dinav cihê
babê xuda.
Bab jinav desên wan îna der..

_ bab..?Bab..?
Rast rabû ser xu,dengê hirçekê jê hat,wek har û dîna kire hewar..
_ ne...Wenekin...Heware.. Ne.. Ne..
Kur,tirsiya,paşve revrî,qesta dayka xu kir.
_ dadê?!Babê min yê dîn bûy?
Daykê,hemû tişt hêlan û qesta jora wî kir.
Yê dinav xoha leşê xuda bûye av,rengê miriya yê girtî,bêy
biaxivit,bidesta gûtê,
hindek avê..
Kopekê ava tezî kire didestda.Piştî av dinav hinavên wî geriyay.Bêhna wî hat,qotana
dilê wî sist bû.
Berê xu da navçavên jina xu,zanî hizar pirsiyar diamadene.
_ texêre ?
_...
_ biçûka nehêla tû binivî?!
_ mala wî ava!Baş bû ez hişiyar kirîm,dibit ez dixew da jitirsa mirbam!
_ malate!Xêrbit?Te ez tirsandim,ka bêjeç bû?Te çi xewin dît?
Jiber lerzika leşê xu neşiya biaxivit..
_ paşî... Paşî...
_ ez jibin serê te naçim,heta rastyê nebêjî!
Zanî,çu care neman,zanî,yê bûye barek giran liser milên wan jî.
67
Wî jî diviya êşa xu bû êkî derkit,êk wî barê giran,harî wî hilgirt..
_ her ew xewnên berêne.Carekadî limin dibine mêvan!
_ xewnên berê?!Xewnên çi?!
_ ew hevalên min yên lipirag hatîne şehîd kirin,berî çend salan!
_ ew kengî bû?Mate ne jibîr kirbûn?

_ belê..Lê carekadî ez cume wî cihî.
_ cihê rodan lê bûy?
_ erê...Hemû tişt limin nû kirin!
_ min gelek pênexoş bû hûn biçine pirag,lê jiber Husên min şerm kir bêjim!
_ min hemû tişt jibîr kiribûn.Çucar min bawer ne dikir, ez dê çime wî cihî!Eve çend
sal bûn,min hizra wan ne dikir!
_tû neheq bûy!Ma te çi dest dirûdana wan da hebû?! Mate çi pê çê dibû bu wan
bikî?Ew baştirîn hevalên te bûn.
Serê xu hejand,herwekû diviya hindek hizirên giran jê bipeşin.
_ tû neyarê giyanê xûy,biturebûnê çu nazivirt,te jin û biçûkên heyn,wan jî mav liserte
heye.
_ erê.. Raste, lê bû dilê min bêje,bû mejyê min bêje, bû wijdana min bêje!
Jor bê ding bû,carekadî xu dirêj kir,diviya bimînte bitinê.Jinê lihêfa wî biserdada,û
der ket.
_ deng jikesê ne êt,babê hewe yê wastiyaye.
_ wastiyayê çi?Hindî bûme tişt yên înayn da biwastit!
_ ezmanê xu dirêj nekin,tijî bazarî tiştin.
Dijora dî ve.jina Husên wek îzraylî lihindav serî bû. nehêla binivit,nehêla çu hizra
bikit.
_ Te hay jê hebû?!
_ çî ye?Ew kî bû?

_ dengê Hesen bû!
_ ka sehkê,wî xêre?!
_ jê bigere,dibit libiçûkekî kirbite hewar!
68
_ ma tû nahêlî ez binivim?!
_ heta rastyê nizanim,tû nanivî!
_ turmbêl çû,hate dizîn..
_ hate dizîn?Yan...?!
_ yan çi?Ha?
_ yan wek gelek cara te libinê xu da?!
_ malate!Bihayê turmbêlê jipênc hizar yuruya pitire,ma dê hemûya libinê xu dim?Ma
dê mar kim?Nê ew hîviya jime dikin,heta em digel wan biaxivin!
_ belê...!Hema diêne berahiya hewe..
_ erê wela biçigarekê razî dibin.Dê vêca bela xu jimin veke,da biniv!
Balîvik,pirçqande bin serê xu.Xemên giran,hizrên belav, dengê biçûka.Xew revand.
Gelek ma lihindav serî,çu jê nezanî,dinav bê dengiya wî da hêla.Dergeh lê girt û
derket.
Hevala wê ya dina hizirda berzebûy.
_ ew çi deng bû?
Serê xu bilind kir,zanî neşêt veşêrt.
_ kiçê hema hişbe,ev zelame hindî yên ture bûyn.
Ez jê ditirsim!
_ eve pitir jidemjmêrekiye,ez bi Husên ve,min neşiya tiştekî jê bizanim.Jibilî,turmbêl
çu..Hate dizîn..Û çu pirsiyara neke!

_ sed turmbêl kurî pêlava wan bin.Yê min xema turmbêlê ya jibîr kirî.Xema wî ya berî
çend salan,ya nû bûyeve.
_ xema çiye,berî çend salan?
cihê xu xoş kir,berê xu da wara,ka çu biçûkan goh lê nabit!
_ berî çend salan,lipirag,dû hevalên wî bidestên sîxorên behsiyan hatibûn kuştin.
_ êê?
_ ewjî digel wan bû.Hemû tişt biçavên xû dîtibûn,û
neşiya çu bikit.Çu pê çê nebû.
_ erê...Û çewa piştî van hemû salan carekadî ew hizir kirin?!
69
_ dûhî,bû wê belayê,çubune cihê rodanê lipirag.
ew cihê herdû baştirîn hevalên wî lipêş çavên wî hatîne kuştin!
_ ew qêriya berî bêhnekê,jidilê wî bû?Ne libiçûka xorî?!
_ erê...Jinîva dilê wî bû.Jixewneka dirinde hişiyar kir!
Tirsiya,ew êş zelamê wê jî bigirt,zifirî qesta jora Husên kir,wek diza, dergeh vekir.
Husên yê şerê diniyayê hemûyê dikit.
Didanên wî haha dê êk hêrin,lêvên wî wek dû şêra, şerê wane!
Tirsiya,ew jî qêriyeka weku hevalê xu vedit,ewjî wek wî nîv dîn bibit.Zanî yê dinav
pêlên xewneka harda.
Ronişte bin serî,destê xu dana ser eniya wî ya ter jixohê. Neşiya xu,neviya pitir dinav
destên wan dirindên har da bihêlit.
Milê wî hejand,gazî kirê..
_ Husên ? Husên ?!

Cilivek vê ket,rast rabû serxu.
_ çiye?Ew kî bû?
_ bisimla..!Texêre?!
Çavên xu vekirin,hişên wî kom bûn..
_ hewe xêre?Tû û hevalê xu neşên binivin?!
_ avê..Hindek ava tezî bidine min.
Bilez perdaxeka avê kire didistî da.
Herwekû,ew perdaxa avê bihindek pelên kel da kirîn. Bêhna wî hat,lidur xu zifirî.Berê
xu da navçavên jina xu. Hizar pirsiyar jê dibarîn..
_ çu pirsiyar û sohbeta neke..Turmbêl çu!
_ kuru,hizar turmbêl gorî binê pêlavate bibin.
Ma eve hemû jixema turmbêlê ye?!
_ Ezjî nizanim jiber çiye!
_ hevalê te haha dê dîn û har bit,tû yê wek har û dîna jixew radibî..Hûn nabêjin,hewe
çiye?Çi lihewe qewmiye?!
_ ya min pasporte,pasporta min çû!
70
_ dê her êkadî dine te,te nahêlin bê pasport.
_ erê..Lê dê dilê min helînin,heta didine min.
_ eve ne xewna pasportê bû.Te çi dixew da didît?
Te şer digel nivînên xu dikir!
_ bîra min ne îne.Baş bû te ez hişiyar kirîm.
_ tû dizanî hevalê te wek har û dîna jixew rabû, qêriya wî biçûk tirsandin?!
_ şvêdî lipirag,me xew nedît,xemên wî yên berî çend salan,lê nû bûn.
_ ma hûn çewa çûne wî cihî?

_ bêy em bizanin,me hind dît,em yên licihê rodanê.
Ew cihê hevalên wî lê şehîd bûyn.Her weku ew gav,her weku ew roj û ew çirke!
_ divêt em sobahî bizifirine mala xu.
_ sobehî ne,sobehî ez dê çime polîsan,û daêra pasportan,û gelek çihên dî da
hemûya pê agadar bikim.
_ em jî dê ên,me bibe mal û tû here ser karê xu.
_ nene,ez dê paşî zifirme hewe.
_ dê hilu serekî lihevalê xu bide,diyare gelek yê tureye!
_ jê bigerin,bila bimînte bitinê digel giyanê xu,dibit bersiva hindek pirsiyara jê
bizanit.
Dengek jijora xwarinê hat.
_ werin,xwarin amadeye.
Biçûka wek roja cejnê kirine xar,beref jora xwarinê çûn.Her êkî xu havête ser
kursîkekê û dest da xwarinê. Her wekû eve cara êkêye vî rengê xwarinê dibînin.
_ hilu bila ne mînine lihîviya me,nuke tû gelek yê birisî.
_ min birs ya jibîr kirî!
_ malate,dê xu hosa bikula kujî!Turmbêl û pêlavate. Hema biçûkên te disax bin.
Milê wî girt,jierdî bilind kir,da berî xu û bire dijora xwarnê ve.
_ cihê babê xu bikin.Keremke.Rûne vêrê.
_ ka Hesen?
_ diyare yê nivistiyeve,min gûtbûyê xwarin amadeye! Dê nihu hişiyar kim.

71
_ nene, jêbigere,nivistin bû wî jixwarinê fer tire!
Xu liaxivtina wî negirt.Lihindav serê wî rawestiya.
Xewê hemû leşê wî dagîr kiriye,livîn jê naêt,tinê bêhna wî,wek berevanî jigiyanê.hindek cara biserdikevit û diçite nav hinavên wî.
Baş lihêf biserdada,û hêdî dergeh lê girt.
_ biburin,yê nivisitî.
_ bila binivit,em ne dibiyanî ne.
_ mala heweye.
Berê xu da navçavên Husên,wekû pirsiyarê jê kir.
_ min çucar nedîtiye hosa kûr nivisitî!
Birsiva Husên ya amadebû.
_ ez derdê wî baş dizanim,xudê harîkar bit!
_ keremkin..Hîviye xwarina me bidilê hewe bit.
_ gelek xuşe..dest xoş.
_ min bitinê ne dirust kiriye,eve xwarina dû kabaniyane!
_ bawerke gelek bitam û xoşe..Destên hewe dixoş bin.
_ afiyet bit.
***
Jor ja kere,xew şirre,hizir dibelavin,xem digiranin,leş wastiyaye!
Dengê hevala jibnê wî gelyê asê û tarî hat.
Keniya wan,yariyên wan,serketin û silametî jê dibarî.
Xwe jiser wî berê bilind yê zêrevanî liser dikir.Havête xwarê,qesta kuma wan kir.
_ wey hun bixêr hatin..
Gelek denga gûtin.
_ xêrendar bî.
72

_ êk, dû, sê... Deh...yazde...?!
Careka dê hemû hijmartin..
_ eve çî ye?Hûn deh bûn,nihu hûn yazdene?!
_ em na êne şehîd kirin!Tû lihîviya şehîd bûna me bûy?!
_ heker dirêya azadiya welatî dabit,bila ez berî hewe hemûyan şehîd bibim.
Baweriya wî her nehat,carekadî hevalên xu hijmartin.
Ji tariya berê spêdê,seruçavên wan jêk neniyasîn.
tinê kelexên wan diniyasîn.
_ eve kiye digel hewe?
_ ew hevalekê erebe.
_ ereb..?!Em jiber ereba yên revîne serê van çiya.
Livêrê jî bela xu jime venakin?!
_ eve ji erebên hevale,ewjî yê gehiştî ye şoreşê.
_ ereb!Digel şoreşê..?Ez bawer nakim!
Keniya wan,înana navê ereb,serinca mêvanî rakêşa.
Diviya bizanit ka çi dibêjit,lê hemû dibirsî û wastiyay bûn.Gûtin,paşî..Dê bixu tê gehî..
_ em ketin jibirisa..
_ berî nanî,min ça divêt..
_ ne hûn xwarinê dixun,ne çayê!Heta bû min çîroka vî kabiray ne bêjin!
_ piştî xwarinê,bextê te da..
_ ezdê bêjim û tû xwarinê amadeke.Mane başe?!
_ nebaşe..Lê min çu çare nînin.Dê bêje?
_ ev kabiraye me birêve dîtiye,ewjî yê revî,biharî kariya hevalekê kurd,xu gehandiye
cihên tena.
Wî divêt bigehite hevalên xu liîranê !Tezanî?Dê vêca em jibirisa mirin..

_ û hewe bawerî pê hat?!Ma jibîra hewe çu?Salê çendên wek wî diêne nav me jibû
karên xirab ?!
_ em baş dizanin,lê ewî ne vêt linav me bit,em jî dê gehînine hevalên wî.Ew ne xema
me ye.
73
Mêvanî zanî sohbet liser wî ye.
_ netirse,bira ne tirse!
_ ez jiserokê te netirsiyayme.Tirsa min jixiyanetkariyê ye.
_ min jî wek gelek jihewe.Dû birayên şehîd hene,min jî gelek kes û heval digirtîxanên
dujminî hene.
Ez jî yê jisêdarê revêm !
Zanî,dilê wî ma.Hevala jî gazinde jê kirin.
_ madê çi pê çê bit malate,heker şiya linav meda tiştekî bikit,pa em dê çewa şên
welatekî rizgarikin?!
_ heker wesa bit?Tû liser ser û çavên me hatî.
Dê keremkin,xwarin amadeye.
Pariyekê nanî kire didestê mêvanê ereb da..
_ ereb dibêjin,heker mirovî nanê êkî xwar.Çucar lê nabite dujmin!
Nan jidestê wî îna der,sê cara maçî kir,û havête didevê xu da.Tijî navçava bişkurîn û
kenî bû..
_ ehlan û sehlan..
_ şokiren.. Sopas..
Xew giran bû,hizir dibin kabosî ve har bûn,leş lawaz bû!

Milê wî bimilê, Elî necefî ve ye.Berahiya wan girtî ye, pişta wan berdaye. Leşkerê dujminî,bîseka mezin dirêya wan da vedaye. Lihindav serî,sê çar firokene.jidûr,agir jidevê topa dibart. Erd û esman agire...!
_ ez birîndar bûm...Tû xu qortal ke..!
_ ez te nahêlim,piştrast be.
_ ez her çûm,bila tû ne keviye didestên wanda.
_ netirse,dê litana me ên.Baregayên hevala dinêzîkin. Xu ragire,çu lite nehatiye,nazdariya neke!
_ hîvîdarim tû digerewa min da ne çî !Xu qortal ke.Ez dê şerî kim heta mirinê.
_ ew pariyê nanê te daye min,hêşta tama wî ya didevê min da.Dê çewa te hêlim.Bes
biaxive,ez tenahêlim,xu biparêze,heta hewar bigehite me !
Dengê peqîna û agirî,ser jiaxivtina wan stand.
74
Elî dinav agirê peqînekê da berze bû,deng gelek nêzîk bû,bersiva wî ne dida..
_ Elî....? Elî...?
Xu nêzîkî cihê wî kir, xwîn bi dûvra dirijiya.
Elî..? Çi lite hat?!
Dengekê nizim jibin kuma ber û axê der ket.
_ ne tirse,ez yê bisilametim,ez hosa bisanahî na ême kuştin..
Xu jipşt wî berî, havête berekê nêzîkî cihê Elî.Zanî birîna wî hêşta ya germe.Lê leşê wî
yê sist dibit.
_ Elî, katû?
_ xu biparêze,dengê golla yê nêzîk dibit.
Kilaşînkufa xu bilind kire ser wî berê lipişt.

Ew sacora liber kilaşînkufê,vala kire cihê dengê remiya çekê sivik jê hatî..
_ her bijît,iha hosa xo ragire,bila dujmin bizanit,em bi sanahî şehîd nabin !
hêşta Elî jipesna wî bidawî nehatî,erdu esman bûne agir.Jihest û hişa bû.
Cih ker bû,deng nema.
Çavên xu vekirin,cih ne ew cihe,mirov ne ew mirovin.
Serê xu bilind kir,zanî yê licihekê tena.Lidûr xu zifirî.
Elî necefî,yê birex wî ve dirêj kiriye.
Lirexê dî,tulazek yê pertukekê dixwînit.
Xu livand,deng jixu îna..
serinca wî telazî kêşa.Pertuk dana bin Balîfkê xu..
_ silametiye,tû hişiyar bûy?Nene,tû gelek yê başî!
_ ez likîve me?
_ dinav hevalên xuday.Jiwê pirsiyarê bigere,nuke tûyê birisî?Mane?
_ erê,ez yê birisî û têhinî me.
_ serçavan,nuke dê hemû tişt amade bit.
Gazî hevalên xu kir.
_ hevalînû,xwarinê bû mêvanê me amade kin.
Dê lezê bikin..
75
_ serçava..Silamtiye..
_ sopas.Û hevalê min?Çi halê wiye?
_ ew jî yê başe.Berî te ew hişiyar bibû,birîna wî sivke, wî jî pirsiyarate dikir..
_ û te? Te xêre?Tûjî yê birîndarî?
_ piştî xwarinê,em dê hemû sohbeta kin.Bila?
Serê xu hejand,dilê wî tena bû.

_ xwarin amadeye,keremkin.
_ sopas hevalînû.Dê keremke,navê min azade,dibêjine min azadê hewlêrî..
_ ez Hesenim..
_ û hevalê te kiye?Jirengê wî diyare,erebe!
_ ew Elî necefiye,yê jizulma dujminî revî.Diviya biçite îranê, bigehite hevalên xu.
_ Elî.. Elî..
Dengê Hesen wek zengê diserî da deng vedida.Rast rabû ser xu,xu havête hevalê
xu,da bersîngê xu.
_ hizar hizar cara sopas bû xudê tûyê saxî!
- sopas bû wan hevalên em rizgar kirîn.
Kak azad,te ne gût?Hewe çewa em rizgar kirin?
_ piştî tû têr nan û nîskê bixûy.Û çayeka reş biseda bikî, ez dê hemû sohbetê bû
hewe kim.
Biburin,eve xwarina şoreşêye!
_ nîsk, bab û biraye.
_ dê kerem kin..
Xew bû dirindekê har.Hizir bûne didanên pîrheviyeka pirsî.Nivîn bûne gorekê teng û
tarî!
Dengê firukên dujminî,lihindav baregayê wan keniya wan şêland.
_ xu veşêrin..Xu biparêzin..
Her êk bû xu çû,xu dikunberekî da veşart.
Jiber birînên xu neşiya jichê xu dûr kevit.
76

Dengê kerba dujminî jinêzîk hat,agir berda wan dar û bera,cih tijî dukêl bû..
Elî milê wî girt,jiwî cihî dûr êxist.Azad leşê wî da bersîngê xu yê birîndar.Harî Elî jiaxê
bilind kir.
Licihekê tena veşartin.
Berê xu da navçavên wan,tijî bişkurîne.Tirs newêrt xu nêzîkî wan bikit!
_ hûn natirsin?
_ tirs, jime ditirst!
_ firokên dujminî yê lihindav serê me?!
_ heker mêrin,dê peya bin!
Libin wî berê mezin,hersêya xu kirbûn êk.
Jitengaviya cihî,û jiber tevşên agirê firokan,bibûn êk leş.Êk giyan.Bêhna wan pêkve
biser diket.
Gelî şirr bû,agir vemiriya.
_ herwekû ev kun bere bidilê hewebû?!
_ ma çikêmasî divê kun berî heye?Wî em parastin.
Lihindav serê azad hewlêrî,marek jikuneberî derket.
Çavên wî vê ketin,neşiya biaxivit,lal bû,hişik bû.Destê xu jibin kefşên xu înader.Wek
mirovekê seqet,bilind kire serê marî.Bidengekê nizim,gût.
_ hişiş..Deng û livîna nekin.
Azad,zanî tiştek yê liser milî.
Patka marî girt,û hşik şidand,Elî necefî jî harî wî kir.
Lê jiber birînên xu yên hêşta xwîn jê diza.Marî şiya serê xu jinav destên wî bînte

der,devê xu havête zenê wî, bihemû hêza xu,kire hewar.Rast rabû serxu.Yê dijora xu
ve,dinav xohê da bûye av!
Lidûr xu zifirî,kes nedît,berê xu da dergehê jorê,kes litana wî nehat.
Wênê wî dixudîka kentura cilka da,dibûne sê çar mirov!
Diviya avê vexût,av nebû,diviya gazî êkî bikit,tirsiya hevalên wî birevin!
Carekadî xu dirêj kire ser chê xu.xew verevî, hevalên wî berze bûn.
Rast rabû,wek har û dîna qesta kenitura cilkên xukir. Çantek reş jê îna der.
77
_ Eve ptir jideh salaye,ev çante nehatiye vekirin.
Eve pitir jideh sale,min hûn jibîr kirîn!
Carekadî,hûn bûne hevalên min,beşek jijiyana min.
Ew şeva min lipirag burandî,ez dîsan kirme hevalê giyanên hewe.Ev şeva pirag,ew
şeva jiyana min deh sala paş ve înay,û sed sala pêşve birîn.
Ew şev dê heta kengî digel min bit?!
Çante vekir,her wekû mîneka bin erdî dinav destên wî da.Haha dê peqit.Haha dê
dengê hevalên wî ête goha!
Çante vekir,navçavên azad hewlêrî,wek her dem bikenî bûn.
Çante vekir,Elî necefî,berî her sohbetekê,hizar cara digût.
_ û Elî.. Û ebas.. Û..
Û jinû dest bisohbeta xu dikir..
_ kak Elî..Me bawerî biaxivtina te heye.Pêtivî van sonda nîne.
_ û Elî.. Ez neşêm bêy sond biaxivim.
Keniya wan tijî gohên wî bû.
Çante vekir,dizanî,baş dizanî.Êmanetê azad dikîjan berukê daye.

Baş dizanî,êmanetê,Elî necefî,çewa veşartiye.
Destê wî ma lihindav çantê vekirî,nezanî kîjan êmanetî berî yê dî vekit?!Neşiya
biriyarê bidit.Neşiya cûdahyê dinavbera wanda bikit.
Destê wî gelek wesama,tirsiya lezê bikit,tirsiya dilê êkî jiwan jixu bihêlit.
_ eve azad dûsê fir licigarê dan,te ne gûtê bese!
Lê demê lêvên min nêzîkî cigarê dibin,tû dikiye hewar û jimin disitînî.Eve çi dû
rûyatiye?!
_ lêvên azadî dizirav û nazikin.Yên te wek dû geliyane, ger cigare kete dinavda,ji nîvê
dibûrt!
Kenî bilind bû,azad kete ser cihê xu neşiya jikeniya da biaxivit.
_ heker jiber lêvên min bit!Tû heqî!
_ bawer bike,heker ev sohbet û axivtên xoş û ciwan jiwan lêva derneketban,diviyaba
te ew lêv birî ban!
Hêşa azad jikenyê rizgar nebibû.
78
_ tû dizanî?Dayka heîder çi digût?!
_ çi digût?Digût ez ya peşêmanim,min şo bite kirî.Dê rojekê biwan lêva min daurî..
Dîsan tijî cihî kenî bû,azad neşiya jikenyê beşdariya sohbeta wan bikit.
_ nene,digût,ciwaniya te,şirîniya te,ew lêvên mezin in!
_ ev çi xodê jê staniye?!
Azad bikeniyeka bilind ve gût..
_ ma em nabêjin.. Erebê lêv doqçik!
Kenî nêzîkî gohên wî bû..

Jiber gûtinên Elî û sohbet û dil saxiya wî.Dest da êmanetê Elî û berî bînite der.
_ bibure heval azad,ez dê berê êmanetê Elî vekim.Da digoraxuda ne bêjit,te cudahî
kir.
Da ne bêjit,te azad jimin xoştir divêt.
Destê xu bire wê berûka êmanetê Elî necefî têda. Herweku kore marekê birîndar xu
têda veşartî!
Kumeka kaxez û wêna,dinav turkekê naylunî baş rapêçay da diveşartî ne.Jiwê roja
biriyar day,hemû nihênyên hevalên xu baş biparêzit.
Mav neda xu,çu tişta diyar bikit,yan bizanit.
Evro, peşêman bû,evro jibiriyara xu lêve bû.
Zanî dermanê serêşana wî,ew nihênîne,piştî çend salan, çu giringiya nihêniya
neman.
Tinê derdê kul û birînên wî ne.Taybet piştî wê şeva dicehnema pirag da bûrandî,çu
derman nînin,çu tişt wî tena nakin.Tinê ew kaxez û ew wêne ne,tinê ew êmanetê
girane xemên wî diverevînin.
Destên wî dilerizîn,çav zilkanê digel wê koma kaxez û wênên dinav destan da kir!
Wênê heîderê kurê Elî,kete beramberî stêrka çavên wî.
_ heîder wek mine,dilê şêra yê hey,natirsit.
Direwa nakit,her jibiçûkatiya xu hêmayên serkirda yên heyn!
Tilîliyên dayka Elî,dibin kaxezave dihatine goha.

Huzan û stiran bibejna îmam Elî û Hesen û husêna ve digûtin.
Namekê,dinav destan da,serê xu dixwar.Bêhna kêmiya baranê jê dihat.
79
(bû hemû hevalên peywendîdar..!Bilez..!
Jiserçavkên me yên nêzîkî dujminî.Dujmin yê karê xu dikit jibû hêrişeka mezin bû ser
hemû devera goma..!
Ya aşkiraye,her rikeberiyeka hebit,dê jilayê dujminî ve bidirindetirîn çek ête bersiv
dan.! Bidîtina me,dê vê carê çekê kêmiyay bikar înit wek gelek caran û gelek cihan!
Vêca bilez cihên xu vala bikin,xu û biçûkên xu biparêzin.Hewil bidin çu berihingariyê
nekin!
Name bidawî hat)
_ em deh kes bûn,me xu nêzîkî bngehekê dujminî kir, berî em dest bihêrişa xu
bikin.Erd û esman lime bûne agir.
Ma..Hizirên xu kirin,tilên xu hijmartin,paşî perxandin, royên xu pê vemalîn.Berê xu da
banê jorê..
_ bihemû rengên çekî,neşiyan çu lime bikin,neşiyan dengê me bin ax bikin...
Dûsê rûndik dinav rîhên wî yên puş da hatine veşartin.
_ dû firuka, lihindav serê me agir dibarand.
ew qeramê em diparastin,hemû sot.Agirî jî nedişiya çu lime bikit,em jiagirê top û
teyarên wan bihêztir bûn!

Giriyê ser jiaxivtinên wî stand..
_ tinê wê bêhna jiwî agirî dihat,em gêj kirin.Min kes nedît,ez ketim bin avê, dinav
hindek pûyşê hêşta ne hatiye sotin.Hevalên min man dinîva dûkêlê da.
Bê deng bû..
Azad neşiya xu,gût.
_ û paşî...?Tû çewa rizgar bûy?!
Berê xu da navçavên azadî,çavên wî tijî tirs û pirsiyar û hîvî bûn.
_ bawer bike ezjî nizanim ka çewa ez rizgar bûyme!
Tinê hevala digûtin.Em nêzîkî hewe bûn,piştî firuke çûyn,em lihewe geriyan,me tû dîtî
dibin av û pûyşîve mabûy sax!
_ dibêjin,av yan patekê ter,mirovî diparêzin.Raste?!
_ bawer neke.Ev çekê dirinde biavê bête berevanî kirin!
Piştî hizir kirineka kurt..
80
_ ez lipêşiya wan bûm,ez gelek nêzîkî bingehên wan bibûm.Firuka nedişiya jiber
bingehên xu,cihê min tûp baran kin.Û wek te gûtî,min jî dersoka xu baş ter kirbû,û
didev difinên xu pêça bûn.Dibit ewjî harîkar bit?!
_ hevalên te?!Ew çi lê hatin?!
Dengê giriyê jigewriya wî biserket..
_ te divêt çi lê bên?Lihindav serê wan tûp barana xerdel û siyanîdê dibarî..
Her leşên wan yên pîroz jî nehatin dîtin!
Jor bê deng bû.
Deng jikaxezeka azad hewlêrî hat.Hişên wî cemandin.

Kaxezên Elî necefî,ewên didestîda,wek pertukeka pîroz danane ser cihê xu.
Litana wê gaziya jikaxeza azadî hatî çû.
Kaxez jiçantê xu înane der,danebersîngê xu...
_ hosa bûte naçiteserî.Divêt tû jî bêye ser dînê me..
_ ma bû tû naêye ser rêya me?Rêya rast,rêya hejar û palan?!
_ ez sozê didime te,her demê milletê me azad bû, herdemê em bûne xodan ala û
dewlet.Ez bême ser rêya te.Da em pêkve yeksanyê û dadweriyê û azadyê liwelatê xu
belav kin!
_ bawer neke,heta ewên te gûtîn nebine serwer, çucara tû nabiye xudan ala û dewlet!
_ ez neşêmete biezmanî..
_ tû neşêye min birastiya!
Name,vekir..Bêhna azad tijî difina bû!
Birengê sor hatibû nivêsîn..
... Hevalê xebatê..
Dujmin yê har bûy.Wesa diyare vayrosa xiyanetkariyê ketiye dinav endamên bê wefa
yên meda.
Xu biparêzin,hevala biparêzin.Çu livîn û peywendiya nekin.Heta namekadî..
Her bimînin jibû xebatê..Dawî.
Keniya wê kiça ciwan û xemilandî,nama didestî da û ew agehdarî jibîra wî birin.
Pejna wê,tijî wêney bibû,deng jilêvên wê yên sor diderket..
81

_ azad,ez gelek jite xerîb bûyme,sebra min bikesê naêt.Were,min jî digel xu bibe,ez
gelek ditirsim, dujmin dê me girt.Hemû dizanin,ez yateme, mala min jitirsa dê min
firoşin,were,were!Dê berze bim,dê beref nemanê çim..Were,ez libenda teme...!
Dengê kenî û yariyên biçûka,jidervey jora wî, hevalên wî tirsandin.Hemûya xu
veşartin,kes lidura nema...
Ew kaxezên didesitî da,têkivedan,kes nedît.
Dengê qotana dergehî,cih şir kr.
Qotana dilê wî zêdekir.Tirsiya,recifka leşê wî bû xuh. Herwekû lihîviya sêdarê,haha
dê milên wî girin, haha dê kevte beramberî giyanê xu û hevalên leşê wan lixerîbiya
hêlayn!
_ ew kiye?!
Dergeh vebû,bikeniyeka tijî hîvî.
_ ma dê kî bit?!Te xêre?Mêvanên xu yên hêlayne liser xwarinê bitinê û wek pîremêra
dergeh lixu girtî?!
_ ew ne mêvanin, mal mala wan.
_ raste.Lê yên jiber te hatîn,ne hatîne xwarinê bixun!
Berê xu da wan kaxezên dinav desitî da,didilê xuda gût, baş bû ev kaxeze nedîtin!
_ ka bû min bêje?Tû bû nehatiye ser xwarinê?
Min hizir kir tû yê nivisitî!
_ ez yê têrim.

_ wenîne!Rengê te yê zer bûy.Eve şivêdî tû hatî,ne nan û ne av te ne biriye devê
xû!Ma min ageh jite nîne?!
_ bela xu jimin veke.
_ dîsan ew çi kaxezin te înayne der?Ma te jibîr ne kir bûn?!
_ eve beşek jijiyana minin,dê çewa jibîr kim?!
_ em jî beşek jijiyana tene,heker ez neşaş bim?!
Mejî mav liserte hene!
Berê xu da navçavên wê,ew kenî û bişkurîna berî wê gavê nemaye,tijî çava rondik
bûn,wek biçûkekê sava, xu havête nav sîngê wê da û jidil pêkve giriyan.
Giriya wan,serinca biçûkekî kêşa.Qesta birayê xu kir.
82
_ bû babê min û dayka min digiriyên?
Husên jinav hizirên xu derket.
_ babê te digiriyêt?
_ erê.. û dayka min jî.
Qesta jora wan kir,dergeh qota,ew xoşiya herdû têda bû nehêla.
_ keremke?
_ biburin,eve çî ye?Raste hûn yê digiriyên!
_ evî mala min wêran kir.Piştî van hemû salan.Hêşta yê bû hevalên xu digiriyêt!
_ zehmet nebit,me bihêle bitinê.
_ keremke,hîviye tû bişêy jinav van xem û kaxeza bîniye der!
Destê xu dana ser milî.Ketine beramberî êk.
Hizra herdû birine roja niyasîniya wan ya êkê.
_ kurê min êmanetî teye,heker tû digel xu nebiye ewrupa,ez wî nahinêrim.Yê kêm

xwandine,çu ezmana nizanit.Dê berzebit.
_ tû mirovekê gelek zanay,tinê ya jite kêm,êkî wek mine.
_ ez dixema sohbeta babê tedanim.Digût yê nezan û ne xwandeware.Dê berze
bit.Negût dê hewe hemûya bite ser avê û têhinî zifirînit..
Bişkurî,Husên jî jinav hizirên wî azad kir.
Ronişte ser lêva textî birexve.
_ heker dê hu kî?Ez çucar têkiliya te nakim.
Ez baş dizanim,ew heval çi bûn dijiyana teda.
Lê eve çend sal bûrîn,û te çu dest diwî karî da nebûn.
tû ne eger bûy.Ne goneha tebû!
Serê xu bilind kir.Wek biçûkekê gonehbar.
_ min çu bû wan nekir.Min tula wan venekir.
Min kelexên wan lixerîbiya hêlan.
_ ne bite bû,dem û cih û kawdana,wesa dixwastin. Kesê çu desthelat nebûn.
_ raste , raste..
83
_ vêcarê,ez bûme eger!Şaşiya min bû.Te jibîr kir bûn. Min tû biriye wî cihî.ez
kunehbarim.
_ nene,neke kuneha xû.Min çucar jibîr nekirîne.
_ wek min gûtî,ez gonehbarim,heker tû xu nekiye mirov û jivî kevlujankî dernekevî,ez
dê hest bigonehbariyê kim û ez dê têkiliyate lixu heram kim.Tezanî?!
_ gelek bizehmete,gelek bizehmete.
_ çu tişt bizehmet nînin,heker mirov zelam bit.
Berê xu da navçavên wî,zanî barê wî yê giran kirî,tirsiya wî jî jidest bidit.

_ xema ne xu,hevalîniya te bû min geleke!
_ heker rast bit!Hilû here çavên xu bişo,û were têr bixo,da ez bawer bikim.Û başî dê
te bime cihekî xoş,da tû diniyayê û xemên wê jibîr bikî.
Lê berî hemû tiştan,divêt tû van kaxez û wêna bisojî.
_ ne..!Bibure,ew êmanetin!Ew wek pirsgeheka pîrozin bû min.Herdemê ez şaşiyekê
dikim,ez qesta wan dikim.
_ divêt tû van êmaneta bidiye xudanan.Da tû jibenda wan rizgar bibî.Hewil bide
diseredaneka welatî da,biçiye malên wan.
Erê,here malên wan,digel kes û karên wan biaxive, rastyê bû wan bêje.Ez bawer
dikim dê bêhna te fireh bit.Dê jivî baznê te bû xo çêkirî derkevî.
_ min gelek ew hizir kiriye,lê min ew dil û ew şiyan nebûne.
_ diçara bêt da ez û tû dê pêkve çin,û dê van kaxez û wênên wan jî digel xu bin,û dê
çine malên wan û dê digel hemûyan axivin,dê rastyê bû wan bêjin.Da tû tena bî.
_ sopas.Te dilê min tena kir.
_ karê xu bike,divêt em tula xu bû kiçên pirag ne hêlin!
_ ez neşêm bême pirag.
_ em tûla xu bû kesê nahêlin.Wan dilê meyê sotî.
Vê carê jidil kenî,ew kaxez û wêne pêçan,û carekadî kirine diwî çantê reş da,û çante
havête dibinê kenitura cilkada û qesta cihê dest şoyê kir.
Carekadî,kenî û sohbet tijî dîwana wan bûn,lê pirsiyareka har,serê jinkên wan

dixwar.Taybet jina Husênî.
_ divêt hûn rastyê bêjin!
_ rastiya çi?!
84
_ rastiya xem û tûrebûn û..!
Jina Hesen pirsiyara sîyê kir.
_ û dizîna turmbêla hewe..?
_ turmyêl çû..
_ bila wêvetir biçit, lê çewa çu?
_ hate dizîn!
_ çewa..? Û likîve?!
Hesen neşiya xwarina xu bixot,kaçikê xu dana û ma hilawîstî dinav pirsiyarê wanda..
Husên dengê xu bilind kir.
_ turmbêl çu,hate dizîn û bes! Bihêlin ev camêre nanê xu bixût.
Herduwa zanî nedemê van sohbetaye,sohbet gohartin.
_ hûn dê evro me kîve bin?Dê çi şîv dine me?
_ binîva dilê heweye.
_ tinê medivêt jivî avahî derkevin.Em nehatîne ronin.
_ û tû çi dibêjî,kak Hesen?
_ wek te gûtî.Binîva dilê wane.
_ dê bixû,û karê xu bike,da dinav bajêrî bigêrînin.Da bajêrê xu nîşa wan bidin.Û bila
baş birisî bibin,başî...
_ başî em dê zanin ka dê çi kin..
Dengekî kire hewar..
_ gelî biçûka xu lêk bidin,em dê çine bazarî,dê çine (mêkdunalsê).
Hemûya pêgve kirine keyv û qêrî.Her êk bezî dayka xu,û karê xu kirin!

Bajêr yê jixew rabûy.Cade,kulan,bazar.Ditijî mirovin. Evro,roja bêhnvedanêye.Hemû
yên linîva bajêrî kum bûyn.Kirîn û firotin, dikuka xodaye.
Her êk jiwan çar biçûk hene.
Heşt biçûk.û çar mezin.Her cihê diçinê, tijî deng û livîn dikin.Serinca xelkî dikêşin.
Livî welatî,herkesê jidû biçûkan pitir digel bit,wek tiştekê ne siroştî diyar dikit.Dibite
temaşe,hemû kes biçavekê hinêrî berê xu didinê.
85
Bêhna zelama teng bû.
_ da biçine cihekê bê mirov,şerma me çû.Em yên bûyne pêtirankên xelkî!
_ bila xelk serê xu lidîwara bidit.Ma jiseyên wan çêtir nînin?!Her êkî dû sê se yên
digel!
_ welat,welatê wane.Sa xûdan kin.Kera xûdan kin, mayê me tê naçit!
_ mayê wan jî dime naçit..
_ raste,belê em wastiyan bivan biçûka ve.
Da biçine baxçekê xoş,dê biçûk jî pitir azad bin û dê bû xu yariya jî kin!
_ bi keyva mêvanaye..
_ hûn rast dibêjin,van biçûka em hêr kirin.
_ ez dê hindek xwarinê kirim û em dê çin.
Hewe çi divêt gelî biçûkan? Dê çi xûn?!
Her êkî rengekê xwarinê daxwaz kir.
Libaxçê mezin û berfireh.Her biçûkekî qesta yariyekê kir.Xwarin bû dayk û baba
hêlan.

Herdû dayk,ketin sohbet û axivtinên taybet.
Herdû baba xu jihemûyan dizîn,dûr jiwan ketin beramberî hizirên xu.
_ ez dizanim,te divêt bitinê digel giyanê xu bimînî!
_ nene,bawer bike,heker tû nebay û sohbetên te yên xoş neban,ez da dîn û har bim.
_ ez te nahêlme bitinê, pişt rast be.
_ min jî nevêt bimînime bitinê.
_ min gût turmbêla min çu,ez dê jite pitir ture bim.Lê..!
_ malê diniyayê qirêja destaye,diçit û diêt.Lê dema mirov heval û xoştivyên xu jidest
didit.Wî demî pare û malê diniyayê dibine xolî..
_ ew şeva em lipirag mayn,xew neçu çavên min.
Ez neketim dixema turmbêlê da.Min zanî tû nazifirî wek berê.Wê şevê heta spêdê,tû
dixewda daxivtî..
_ ma ez kengî nivistim?!
_ te gelek sohbet kirin,wek dîna lite hatibû,ez jite di tirsiyam.
86
_ wê şevê,ez zifirandme berî çendîn salan.Berî serhildanê.Ez zifirandme şoreşê,girtîxanê,xerîbiya, hevala.
Heta ez înayme ser kelexê azad û Elî...
_ wê şevê, ez jî jidil û wijdan hejandim.Min jî eve çend sal bûn hizra çu tişta
nedikir,hizra wê şoreşa me kar bû kirî,hizra şehîd û hevalan,hizra kes û karan,hizra
dayk û baban.
Eve demekê dirêj bû,ez bibûm kerê karî.Jikarî pêve min ageh jiçu nebû!
_ kar ne şerme,lê nabit hemû dem û mejyê mirovî bû karî bit.

_ tû baş dizanî kak Hesen,min çend hejarî û nexoşî dibiçûkatiya xu da dîtîne.Min
nevêt biçûkên min hest bikêmasiyekê bikin,min nevêt Ewa min dîtî,ew bi bînin.
_ netirse!Dem ne ew deme,cih ne ew cihe!Jijiyana wan ne tirse.
_ erê.. Ma heta heta em dê livî welatî jîn?
_ tejî libere bizifirî?!
_her kesê welatek hebit,divêt gurê wî liwelatê wî bit.
_ eve cara êkê ye,min goh lê dibit,tû behsê mirinê dikî. Xudê xêr kit...
_ mirin bila bixêr bêt,tinê min tola xu vekir ba!
_ tû liser tolvekirinê yê rijdî?!
_ çu pê nevêt!Ez tola xu bû kesê nahêlim.
_ ma tû pêve naçî?
_ ne..Ew tumik bû,da kiçên pirag kehî bin,bisanahî bikevne davên me.
_ hejara ew bixu dibê çeng û kehî ne!Çu tumik û dav pê nevên.
Lidur xu zifirî,ka kesê goh lê nabit,devê xu bire bin gohî.
_biserê te yê ezîz,ez cihekî dizanim,tû dê mîniye heyirî û nizanî ka kî jikîjikê ciwantire!
_ pate bû em birine nav kuna diza?!
_ zikê min yê diriyay.
_ erê.. Sera birisê..Kete hebsê.
_ mal mîrata nehêlan em çu bikin,min diviya bûte bikime hilketin.Min liber bû te
bibime wê malê,û te pavême nav kuma wanda,û bêjimete.Dê heker tû mêrî,dê zanî ka
kî jihemûya ciwantire!
_ şûna kiçên ciwan,te ez birime nav diz û polîsan.
87

_ suz bit,ez tola wê rojê û wê şeva giran vekim.
Şiya lêvên wî bikeniyeka sar bixemlînit.
_ tûjî suzê bide,wê karesatê jibîr bikî.Bese te jiyana xu û ya biçûkên xu kiriye dozex.
_ ez neşêm sozê bidim,heta binemalên wan ne bînim.
_ eve hizireka başe.Here seredaneka welatî,û here malên wan,û rastyê bû wan
bêje.Ez bawr dikim, ew jimêje rastyê dizanin,herdû endamên dû parta bûn, nuke her
pirsiyara wan hatiye kirin!
_ dibit,lê dilê min tena nabit,heta dayka azad û kurê Elî, gerdena min aza nekin.
_ herkesê goh lite bit,dê wesa hizir kit,te ew yên kuştîn!
_ min ew nekuştîne,lê min ew hêlan bitinê lixerîbiya.
_ kesê nedişiya bu wan çu bikit,çu rê nebûn, partiyên ew endam têda,neşiyan çu
bikin,rûdan ji hemûyan mezintir bû.
_ partyên kesê bû çu nakin!Lê heval bû hevalî xu didite kuştin.
_ dê here welatî,û wan bibîne,paşî tû dê bawer kî. Herkesê çû,hate jibîr kirin,kes xu
gorî kesê nakit.
Te jin û bçûkên yên heyn,wan jî mav liserte heye,wan jî divêt tû dinav wanda yê
amadebî.
Dengê keniya dû kiça,sohbeta wan birî.Berê her duwa kete cihê kenî jê hatî..
Kiça zanî keniya wan nêçîrek kir,xu pitir çivêl kirin.
Nêratiya wan har kirin,jin û biçûk jibîr kirin.

Bû çavzilkanê digel wan.
Kiçekê qesta wan kir..
_helû... Hewe cigarek heye?
_ me dû cigare yên heÎn..
_ me tinê êk divêt..
_ wey serçavan.. Keremke.
_ sopas.. Heta dîtinakadî.
_ bû heta dîtinekadî?Werin pêkve cigara xu bikêşin.
_ heker hewe bivêt.Hûn werin?!
88
_ eve em hatin.
_ dê kîve çî?Ma tû garana biçûka digel xu nabînî?!
_ biçûk xemate,eve ez çûm.
_ dê were,jê bigere,ne demê wane.
_ pa kengî demê wane?Heta em pîr bibin,Mane?
Dengê biçûkekî, nêçîra wan revand.
_bab.. Bab.. Werin da biçine mal.
_ iha min çi gût?
_ dabiçne mal,bihîviyateve bit,me ter nekir.
Berî bêne nik biçûkên xu,xatira xu jiherduwa xwastin,soz dan carekadî bêne vî cihî.
Wek dû peykera dinîva biçûka da man mendehoş. Diniya lê tarî bû, beref mal dane rê!
_ 10 _
Serê wî bibû zikê jina liber biçûk bûnê.
Diviya wê kula didilî da kêm û edavê girtî,bipeqînit. Diviya wê bakuzîrka dimejî da
vemirînit.

diviya wî robarê şêlî yê dinav dilê wî da.zelal bikit.
_ ewa me kirî.Ewa hatîye serê me.Hemû hate jibîr kirin?!
89
Serê xu yê giran hejand.Tijî lêvên wî bişkurîn bû,hate bîra dema hevalê wî yê
pêşmerge digût:
_ sopas bû xudê em nehatin şehîd kirin.
Ne jitirsa giyanê me,lê jitirsa biçûkên me da mînin bê xudan,û da berpirsek jina me
mar kit,yan da kite êvelî!
Wî demî,gelek kenî.Nihu zanî ka wî çi diviya bêjit!
Kesê ageh jiyê dî nîne,her kes libere zikê xû têr kit.
Bila hevalê wî yê birsî bit.Her wekû eve ne ew kesên xu gurî êk dikirin,xu bû êk
dikirine çeper!
Xebat hate jibîr kirin.Ewên lidestpêkê wastiyayn.nihu pitir diwastiyayne.Şehîd tinê
liahenga diête bîra wan,tinê çend çirkeyeka bû giyanê wî dirawestin,paşî çihên xu
liser kursîka xoş dikin.
_ biburn,ez yê limala azad hewlêrî digerim?
_ azad..Azad hewlêrî!Tû dizanî nîva hewlêriya navên wan azadin..
_ lê tinê êk bû jihemû dilê xu bû welatî kar dikir.
Zanî yê wastiyaye,zanî barê wî yê girane,hêla û çu ser rêya xu.
_ bibure ez nizanim..
Rêya hindekên dî girt..
_ ez yê limala azad hewlêrî digerim..
Bêy digel biaxivit,tila xo dirêj kire malekê..

Dergehê malê qota,li hîvyê bû azad bû dergehî vekit!
_ eve ye mala azad hewlêrî?
_ nexêr..Eve mala Mamusta Salare.
_ diyare Mamusta Salar birayê şehîd azade?!
_ şehîd azad?!Me çu şehîd nînin!
_ tû jivê malêy?
_ ez xêzana Mamusta Salarim.
_ ez dişêm Mamustay bibînim?
_ belê, keremke.
90
Lijoreka mezin û lêkday ronişt,lidîwarê beramberî wî, wênê serkirdekê mezin
hilawîstîye.Li rexê dî wênê bûk û zava diperwazekê zêrîn da hilawîstîye.Dinav
ciwaniya jorê da berzebû!
_ tû bixêr hatî,ez Salarim.Keremke?Ez dişêm biçi xizmeta te bikim?
_ bibure,Mamusta.Ez Hesenim,hevalê şehîd azadî me..
_ azad...?Ha...!Birastî wî kuleka kûr êxiste dilê me mirovekê dil sax û xoştvî bû.
_ ez bawerim,tû birayê wî yê mezinî?!
_ belê, raste.
_ min diviya dayk û babên wî bibînim,min diviya xoştiviya wî bibînim..
_ bibure,behsê xoştiviya wî neke.Û dayk û babên wî yên mirîn!
Serê wî pitir giran bû.
_ ez dişêm bizanim ji bû çi pirsiyara xoştiviya wî nekim?!
_ xoştiviya wî ya şû kirî,û gehiştiye mal û mêrên xu!
_ lê..?
_ bibure,min dem nîne.Heker te tiştek taybet heye bêje?

_ birastî ez digel bûm demê şehîd bûy...
_ ez dizanm.ew çu xu gorî welatî kir.
Neşiya xu,çavên wî tijî xwîn û rondik bûn.
_ herweku hewe yê bîr kirî?!
_ divêt em bijîn,çi libîra me bit yan ne.
_ lê eve çend sale jibîra min ne çûye.ez neşêm baş bikenim,jigiraniya barê xu,ez
neşêm bijîm.
_ wesa diyar hûn gelek hevalên êk bûn!Bibure,divêt ez bigehme karê xu libaregay.
Kulan lê hate êk.Rê tarî bû.Nezanî dê kîve çit.
... Dayka wî ya mirî...Babê wî yê mirî...Xoştiviya wî ya şû kirî...Birayê wî yê jibîr
kirî...Kelexê wî ligoristanekê linêzîkî pirag tijî ser giyaye!
_ bira..Tûjî bes xema wî bixû.Eve te biçavên xu dît û bigohên xu goh lê bû,ka birayê
wî çend xema wî helgirtiye?!
Diniya hûye,yê çû,ew hate jibîr kirin.
91
_ ez jî dê wan jibîr kim..Erê,ez jî wek kes û karên wan, wek yar û hevalên wan,ez jî dê
wan jibîr kim.
Lê ez nizanim dê çewa wan jibîr kim...?!
_ te çewa mala Elî necefî dît?
Serê xu kire dinav destên xu da,hişik şidand,diviya mejyê wî bizêt,diviya tiştek jinav
naxê wî derkevit.
_ bîra min ne îne!

_ divêt ez bizanim,da bişêm harî te bikim.
_ kes neşêt harî min bikit.Tinê şev û roj dê min kine mirov!
Cih şir û bê deng bû.Giyanê wî bû kutirek û digel hizirên wî zifirîn.
_ ez yê limala Elî necefî digerim,Elî necefî?Babê heîder?!
_ nîveka xelkê necef navên wan Elîne,û hemû babên heîdern..
_ berî çend sala lipirag hatibû şehîd kirin?!
_ lipirag..?!Pirag çîye?!
_ pirag paytextê çîke.
_ çîk...?Ma şoreş jigoma derbaz bibû?!
Kenî tijî kulanê bû.Lêvên wî jî xemilandin.
_ biburin,ev kese yê pirsiyara mala heîder dikit!
_ wî çi divêt?Mane bese?Ew jî gurî xu kirin?!
_ xoşkê..Ew ne xelkê vêrê ye.Hevalê babê heîder bû...
_ babê heîder..?! Elî?!
_ erê..Ez hevalê Elî bûm.
_ hewe Elî gurî xu kirin.Hûn têr nebûn.Hewe bela xu ji heîder jî venekir heta ew jî gurî
xu kirîn.Nihu me kes nema.Xu bigirin,heta kurê heîder mezin dibit,da wî jî gurî xu
bikin,yan dê hema vê gavê bin....?
Giriya wê,dilê wî sot,tep û mstên wê lileşê xu didinan, herwekû liserê wî diketin.
Wî jî biherdû desta biserê xu dada..
_ heîder jî şehîd bû?!
92
_ erê jibû çi hûn rojekê misteka arî....?Parçeka cilkî...? Dû filsa?Digel xu bû van
sêwiya naynin....?!

Dengekê awazên giriyê jê bilind bûn.
_ tinê navên wan şehîdin..Kelexên wan jî diberzene...
Roj,wek tîrorstekî lihindav serî bû,agir jitîjkên wê dibarî. Leşê wî yê wastiyay,hest û
hizrên wî yên birîndar,di gezandin.
Kulan tijî gilêşe,tijî sêwy û gerokin.
Liher kujiyekî,mirov hest dikit,tîrorstek yê çavzilkanê digel giyanê mirovî dikit.
Liser her dîwarekî,dehan navên şehîd û kujtiyan dihilawîsitî ne.
Bazar û kulan,tijî patên kesk û reşin.Navên her sêzde îmam û hemû serkirda,ji navên
xu baştir dizanin!
Nan dilûliya tivenga ra digehte gewriyên wan.bêhna xwînê jibangê nivêja diêt!
Mezarên îmama,yên bûyne baregayên partên siyasî. bazara kirîn û firotina
baweriyan,jibazarê gazê bibiha tire!
Rengê jiyanê ya hatiye gohartin,dan û standin ya hatîye gohartin,çil û berg yên
hatîne gohartin.
serusîmayê bajêrî,berev gohartin diçit!
_ bibure mamusta..Livêrê ne mîne!Ev bajêre ne yê arame.
_ heker necef ya ne aram bit?!Pa kîrê arame?!
_ ez dibêjme te!Zû bizifire wî cihê tû jê hatî livî welatî çu cih diaram nînin.
_ min kes jimala Elî nedît!
_ kes jimala Elî nemaye tû bibînî!
Tijî gerîyên eniya wî xoh bûn,bilêva kirasê xu eniya xu vemalî.

Berê xu da navçavên wî rêberê eve çend roje digel wî, jibû dîtina binemala Elî necefî.
Zanî yê rastyê dibêjit!
_ dayk û babên wî digirtîxanê ve mirin
Dû pismamên wî,sêdare dan.jina wî piştî zanî yê şehîd bûy şû kir.
Eve berî çend heyveke,kurê wî heîder jî bidestên tîrorstan hate şehîd kirin..
Roj lihindav serî har bû,hest kir,mejyê wî jorda digoh û difinan da bû şirrik û hate
xwarê!
93
Rengê wî zer bû,tirs tijî pîstê wî bû.
Lipişt xu zifirî,kes nedît,pitir tirsiya,dev lê hişik bû,li avê geriya.
Rêberî zanî axvtinên wî karê xu liser hest û mejyê wî kirin.
Perdaxeka avê kire didest da.Av dihemû gehên wî yên kel geriya.
Hişên wî yên nivistî hişiyar kirin.
Cih lipêş çava xûya bû.Jiyan digêleşoka xokujtin û berevanyê da ye.
Hizirên hemûyan dişêlîne,paşeroj nediyare.Tirsa wî zêde bû.
Dinavbera wefadariya wî,bû hevalînyê,û rastiya jiyanê.Şerek dijwar rû da!
Leşê wî yê westiyay û lawaz,dilê wî yê jar û bikuvan, mejyê wî yê aloz.Gorepana wî
şerê dirinde ye.
***
... Jina wî şû kir... Kurê wî şehîd bû...
Elî kîye? ... Şehîd...?
Babê wî,dayka wî,pismamên wî,kes nemayne!
***

_ tû şêrê gomanî..Tû bazê nêçîranî...!
_ malate,hindî me goh lê bûye.Di bêjin.şêrê çiya.. Û bazê lata.. Ma gomajî şêr û baz
hene...?!
Keniya wan biser çiyay ket,ew çûçkên dinav wan diriya ra,jiser hêlîna revandin.
_ şêrê çiya û bazê lata,ew tûy,ew min bû te hêlayne,lê bêhna te ya teng,nehêla ez
sohbeta xu bidawî bînim.
_ jê bigere,wî hemû tişt bû xu divên.
Dibit şêrek û bazek,bû seredan çûbne goman?!
Eha ez ew şêr û bazim!
Keniya wan diniya hemû tijî keyv û birayetî kirin.
94
***
_ bibure, min dem nîne..!
- Azad kî ye?
_ Xuştiviya wî şû kir...
- Dayk û babên wî bikula mirin!
***
Hewlêr,lipêş çava,wek pîrejineka nesax xûya dikir. Kulanên wê,wek kezyên sipî û
nevehandî bûn.xem û nexoşiya,cihê kenî û girnijînê liser lêvên wê yên qormçî
girtibûn.Kelha wê,wek sîngê pîrejineka xudan nevên hejare.
tijî hejar û bê mal bûn.Dilê wê jihîviya yê hişke.
Kes xo lê nakite xodan,kes berevanyê jê nakit.wek caran.demê liser dibû şer û

berîkanê jibû ramosana wan hinarên rûyan.
Rûyên wê yên çirmisîn,kes simbêlên xo vêra na husît. Çavên wê yên hişik
bûyn,rondik jê na zên.
hejar û evîndar avê jê vexon.Kes sirûd û huzana bi bejna wê nabêjit.
Kiras û kurtekên wê,parçe parçe,"liŞêxlla" hatine firotin.
Hemû pêkve,heval û neyar.Liser qerqodê wê yariyên siyasî dikin!
Çu kenc nînin,çu telaz nemayne,lişevên serma û rojên birsî,xo gorî kiçeka hejar
litaxekê bê moxtar bit!
Hewlêr,ya pîr dibit...
Şer,dijwar bû,hest zifir bûn,peywendî veqetiyan, mirovayetî,bû peyveka biyanî,zanist
bû bazirganî.
Ewên dohî guştê şoreşgêra dixwarin.Evro liholên berfireh,pesna wan diête
kirin.Pêkve dilîstekê da xo dihelbjêrin!
Şer,bû agirekê sor,mejî lê ron kir.Ew kula didilî da bûye kêm û edav.Peqand.Licihê
kêm û edavê,xwîn jê hat!
***
_ tû mirovekê seyrî!Te divêt diniya hemû wek te bit!
95
Ew rojek bû,nihu rojeka dîye.Cihekê dîye.hindek mirovên dîne.Divêt tû xu bigihorî.
Divêt tû ji kevilujankê xu derkevî.
Ne tû bitinê livê diniyayê dijî !
***

Kete dizifirokeka dijwar da,reng jibîr kirin,hest biçu tama nedikir,mirov lipêş çava bê
seruçav xûya dikirin.
_ erê, te ne gûte min? Te çewa welat dît?Te çi kir?Ew egera tû jibû çûy?Te bicih îna?
Pirsiyar negehişte goha,ew devê deng jê derketî.Wek dupşkekî hate pêş çavan!
Diviya bitinê bit,diviya digel giyanê xu bimînit.
Livîn,axivtin,awir..
Bibûn gorgên har,leşê wî didane ber leqan!
_ xu mijûl neke,ez te nahêlme bitinê.Divêt ewa didilê teda,derkevit,da leşê te tenabit.
Serê xu bilind kir,hêşta şerê wefadariyê û rastyê dimejî da yê likar bû!
_ te çi jimin divêt?!
_ min divêt tû xu bikiye mirov.Wek mirova bijî...
_ ma ez ne mirovim?
_ bibure,tû ne mirovê vî serdemî!
_ dibit.
_ min pirsiyara te kir?Te welat çewa dît?
_ welat,her ew welate,mirov ne ew mirovin..
_ wek min gûtî,tû neyê vî serdemî..
_ û min gût dibit.
_ û ew egera tû jibû çûy?
_ evera çi?!
_ ez baş dizanim,tû jiber çi çubûy,vêca bêje ka te çi kir? Te mirovên wan dîtin?Çi
gûtin?Tû jiwî êmanetî rizgar bûy?!
96

Kenî,jidil kenî.Ew kenî bû destpêka serketina rastyê liser wefadariyê da,dişerê man û
nemanê da!
_ mirovên çi? Şehîdên?Kesê ageh jikesê nîne.
_ ma min çi digûte te.Herkesê çu,her weku dayka wî berhavêtî.
_ raste..Hemûyan we digûtin,lê mixabin.Bêjin daykên hindek şêran,berhavêtin...
Mixabin.
_ çu tişt nehejî mixabinyê ne.Tinê ew şeva me lipirag jidest day!
_ tû jiya xu venabî!
_ heta mirinê..Her kirine!
_ kirin jibû paşerojê?Yan jibû pêsîrê?!
_ ma paşerojek jipêsîrê baştir heye?!
_ 11 _
Cih,rêyeka tenge,dinav daristaneka tarî da...
Dem,yê jibîrkiriye.Heval,dengê hindek çûçik û balinda ye.
Dujmin..peyvên mirovayetî,hevalînî,wefadarî,welat, şehîd,xebat,dîn,xoda,kes û
kar,millete!
Armanc..berjewendiyên taybet,pare,jinên ciwan, jiyana bisanahî,kursîkin!
Şer dikuka dijwariyê daye!
_ tû mirovekê seyrî!Te divêt diniya hemû wek bit.
_ şoreşa çi? Şehîdên çi?!
_ te divêt her kesê rojekê wastiyay.Şevekê nenivisitî. Qamçiyeka dujminî leşê wî maç
kirbit.Bigehite mavê xu. Kes ne ête jibîr kirin!

_ padê çewa qesir û bêla avakin?!Padê çewa bine xodan pare libenqên ewrupa?!
_ tû mirovekê dînî..Tû ne yê vî serdemî!
Dengê firîna balindekî,şer rawestand!
97
Zanî jibajêrî dûr ket.Tirsiya.Lidûr xu zifirî,diviya xu veşêrt.
_ hişiyarbe!Xu veşêre,dujmin yê nêzîk bûy!
_ dujmin jihindê kêmtire,ez xu bû veşêrim!
_ ma tû jigiyanê xu natirsî?
_ ew armanca ez jibû xebatê dikim,tirs dinav peyrewê wê da nîne!
_ mirov çend yê mêrxas bit,her ditirst.
_ tirs ne bimêranyê ye,bibaweriyê ye!
Heker mirovî bawerî bixebata xu hebit,natirst.
Vêca dibite mêrxas.
_ dengê xu kêm ke,eve hatin..
_ bila bên,ez amademe...
Dengê reva sivorekî leşê wî hemû hejand.Tijî mejyê wî tirs kir.Lihemû rexa zifirî,çu
dujmin nedîtin.Diviya birevit, diviya bikite hewar.Çu cih nedîtin xu lê veşêrt!
Sivorey,liser çeqekê darê,bihemû dengê xu pê kenî...
_ te digût ez natirsim,xoş mêr?!
_ sivorê pîs,heker tû mêrî dê êye xwarê jidarê..
_ heker tûjî mêrî dê êye min liser darê.Hahaha...
Dest da tayekê darê hişik,bihemû hêza xu disivorey werkir.Her nêzîkî cihê sivorey
nebû.

Zanî yê bê hêz bûy,tiv kire cihê sivorey û pişta xu dayê. Sivore jivî çeqî çu yê dî...
_ pîratîye,ez jitank û topan ne ditirsiyam!
Çu nemabû jiber vî sivorê pîs,min tijî derpê xu mîz kirî.
Lipişt xu zifirî,ka kesê nedît!
_ tirsa çi..?Ez jiçu tişta natirsim.Lê divêt ez bizifirim,ez gelek yê dûr ketîm.Heker limin
bibite şev!Dê dinaf vê darstanê da gorg min xon!
Lez kir,destên xu kirine diberûkên xuda,her çendekê lipişt xu dizifirê!
_ tû jî wek hemûyan,pirsiyara xu bike,daxwaza mavê xu bike,te jî biçûkên heyn,te jin
û mal hene.
_ min jibû pare û kursîkan,xebat nekiriye.
98
_ lidemê xebat û şoreşê,kesê daxwaza çu berambera ne dikir.Lê nihu şoreş ya bûye
dewlet û xodan şiyan.
Çu şoreş,hevalên û endamên xu jibîr nakin.Lê divêt tû jî pirsiyar bikî,kes neşêt
teraziya hemûyan dirust bikit.Berpirs,bihindek tiştên giringtirve dimijulin.Nabit em
hemû gazindên xu biêxne ser milên wan!
_ ya min diviya bicih hat.Milletê me jibin zolim û zordariyê rizgarbû.Nihu ez yê
biazadî çavên xu bi ala Kurdistanê kil dikim.Min jivê pêve çu nevêt!
_ ew ala,kilê çavên me hemûyane.Nan û jiyan, bizehmetin.û tû..Bibure,tû yê mezin
bûy,pêtivî harî kariyêy.

_ babê te yê mezin bit.Ez hêşta yê çarde salî me,jiçarde saliya hêşta bihêz tirim!
_ ez bawer nakim..
_ bawer bike.nesehke van çend mûyên sipî.
Ew ne pîratîye, ew serborin!
_ heker tû rast dibêjî,dê ev şeve digel min êye cihê çarde saliya!
_ te diniya hemû ya gurî zik û bin zikên xu kirî..
_ ma min çi maye jiwan pêve?
_ tû bê minetî.ez amademe..Lê divêt kesê niyas mene bînit.
_ hêşta tû ditirsî?
_ ez natirsim, ez şerm ji jiyê xu dikim.
_ ma min ne gût tû yê pîr bûy?!
_ em dê ev şeve pîr û tulaza bînin !
Keniya kiçekê dikuşa hevalê xuda,kasêta hizirên wî birî...
_ te ez xwarim..
_ xwarin kême,ez dê te cûym!
Kenî mê bû,şer har bû,hizir nêr bûn!
_ dê çi kî?!
_ dê te xûm.
_ çilkên min hemûya bêxe..Min rûs ke..!
_ tû jî min rûs ke.
99
Deng bilind bû,mejî dikêleşoka şer û xebat û nêranyê da,kete dizifirokeka dijwar da !
***
_ kî jihewe,ewên bê jin û mal,sîngê kiçekê dîtîye?Yan maçek likiçekê daye?!
_ eve çi pirsiyarên bê meirîvetin?

_ nene,jê bigerin,ez jî wê pirsiyarê dikim.Kê heta nihu yarek heye?Kê leşê jinê
dîtîye?!
_ ewên lileşê jina digerin,naêne vî cihî!
_ bû?!Ma em evên livî cihî ne mirovin?Ma dilê me naçite leşê jina?!
_ birastî divêt em pitir hizra xu divan pirsiyara da bikin. Jin beşekê serekiye djiyana
mirovî da.
Lê jiber dîn û xêl rewştên kirêt,me ya xu jijinê tirsandî û..
_ bibure heval.her tiştê mirov mavê wî bidirustî biditê,ne dîn û ne rewşt û ne
xêl.nabine asteng..
_ kesê bersiva min neda.Ez dê dîn bim?!
_ diyare te tiştekê hey?!Hema bû me bêje.
_ erê wesa diyare,dê bêje,bike ser berkê...
_ ez şivêdî...
_ ê..?
_ şivêdî ez dixewda yê bûyme zava...
_ wey liser xêrê bit.Nexşe lirastyê...
Kenî tijî nav tiraşa bû.
***
Dengê gohnêlyê jinêzîk hat.
_ te çi divêt?Dûr keve..Berazê pîs.
Hind dît yê lihindav serê herdû leşên rûs.
_ bibûrin,min hûn ne dîtin.
100
Herdû leş dimijûl bûn bialîstina êk ve.jikerbên wî da,pitir dengê gohnêaya xu mê û

dijwar kirin.
Paş ve revî,lez lipên xu kirin.Gelek çara lipişt xu zifirî.Rê liber berzebû.Leşê wî yê
wastiyay,jixuhê ter bû.
***
_ tû na tirsî.Ez baş te diniyasim.Tirs jite ditirst!
_ sopas heval.Ez amademe jibû xizmetê.
_ tû û dû hevala bû xu jê bigire.
Divêt hûn wî sengerê dirêya meda,ev şeve bisitînin.Da em jibû hêrişa mezin amade
bin...
_ çu heval pê nevên,ez dê bitinê çim.Tinê hûn libenda bersiva min bin.
_ lê...
_ ez bitinê têra deh sengerên weku wî Heme.
Wek min gûtî,lihîviya bersiva min bin!
***
Dengê horêna turmbêlekê,xwîna wî hişik kir.
_ ma tû yê kurey?Berê te likîve ye?
Leşê wî germ bû,jibinê piya lerizî,çav lê tarî bûn,xu jilêva cadê dûr kir.
Li ber dîwarekî rawestiya,hişên wî kum bûn.
_ eve min xêre?Çu nemabû turmbêl min bikujit!Divêt ez pitir gohê xu bidime xu...
dengê telefona diberuka wî da,dil lê qetand.Recifa wî zêdekir..
_ helw?
_ eve tû likîvey?Min jideh cara pitir telefona te kirî ye.Tû bû bersiva min nadî?
_ deh cara ?Bawer bike,min goh lê nebûye,bibure.te çi diviya?

_ ma dê min çi jite vêt?!Were mal,were nav biçûkên xu. Matû birisî nabî?Matû
nawastyêy?
_ ez ji birisa mirim..
_ dê were,xwarin amade ye..Gîro nebe, ha!
101
_ eve ez hatim..
Bajêr, lipêş çava yê biyanî bû,kulan,nediniyasîn,mirov dibê seruçav bûn.Deng jihemû
tişta dihat,ser lê hêr kirin. Gelek cara dîwar,wek turmbêlan liser tayêra dibezîn.
Mirov wek balnda difirîn.Ew kaxezên liber piya,dibûne çiya!
Dengê telefona mala wî,hemû jixewa giran hişiyar kirin.
_ helw..?
_ biburin,eve mala Heseniye?
_ belî keremke,tû kî?
_ ez dixiturim.Hesen mêvanê meye.Da hûn bizanin.
_ çi lê hatiye..?! Wî xêre..?!
_ netirse, çu lê nehatiye,tinê tûşî gêşbûnê bibû.Nihu gelek baştire.
_ ez dişêm nihu bibînim?
_ pêtivî nakit,nîvşeve û yê nivisitiye,sobe tû dişêy bêye seredana wî.
Wek min gûtî,yê başe,lê divêt dûsê rojeka bimînte lixestê.
_ sopas dixtur.
_ şev baş..Heta sobe..
_ heta sobe..
_ 12 _
_ te ne gûte min,wê nîv şevê hewe çi dikir liwî cihî?!
_ bîra min ne îne,min ya jibîr kirî.û min nevêt carekadî bînime bîra xu.

_ tinê rastyê bêje.Hûn liçi digeriyan?!
_ tû baş rastyê dizanî.
_ min divêt tû jiserî heta binî bidevê xu bêjî.
102
_ bela xu jimin veke.
_ heta ez rastyê nizanim,ez bela xu jite venakim.
_ em jikumbunekê dihatin.Hevalekî em daxwaz kirne xwarinê licihekê taybet.
_ cihekê taybet?!
_ erê..Ne ew cihên tû hizir dikî !
_ ê?!
_ em jiwî cihî dihatin,piştî demekî xoş me burandî.
Me nezanî ew kes hevalê dujminî bû.Em kirine dinav tora sîxora da.
_ hewe çewa bawerî pê hat?
_ hevalekê nêzîkê Elî necefî bû,Elî gelek bawerî pê dihat.
_ hîvîdarim min xemên te giran ne kirbin.Tinê min divêt tû wê rodanê jibîr bikî.
_ bivan gûtinan,xemên min giran nabin,ez yê vêrbûym.
_ te soz dabû,wê roydanê jibîr bikî.
_ erê...Sozbit.
_ te çi libere?Dê çi kî?
_ ez yê lihîviya hevala,liwelatî,dê cihekê baş bû min diyarkin.Dê zifirim xizmetê kim.
_ cihekê baş...?Wek çi?!
_ ez jî nizanim,ew baştir dizanin,her cihê bû min diyarkin. Ez amademe.
_ hindeka belên dayne te?Dê harî te kin?
_ xebat û qorbanyên min,dê harî min kin!
_ ji bîr neke,divêt tû jî pirsiyara mavê xu bikî.

_ min ne jibû mavê xu bitinê xebat kirî ye!Ez beşekim ji milletekî.
_ millet!Hêşta tû yê liser demê şoreşê dijî!
_ pîroztirîn dem bû...
_ erê...Lera ez dibêjim pirsiyar xu bike.Eve ne demê şoreşê ye !
***
_ helu? Çi lê hat?
_ çi liçi hat?!
103
_ çi liwê belêna hewe daye min hat?
_ belêna çi?
_ ma hewe ne gûtibû min,em dê karekê baş bû te peyda kim?!
_ karê çi?
_ hevala gûtbûne min,em dê karekê baş bû te bînin.
_ kê gûtibû te?
_ hevalên min yên şoreşê..
_ hevalê te berûka teye!
_ xebata min,hevalê mine.
_ reşo bidestên xo,heker av dê tebit...!
_ ew çewa....?!
_ bawer bike.
_ ez jivêrê jî bûm,û liwêrê jî hatime jibîr kirin?
_ liwêrê bû xu bineciheka baş dane.Tû xudan biçûkê !
_ ez neşêm livan welata bijîm.
_ livêrê jî tû yê biyanî.Jiyan ya bizehmete..
_ helu.. Ez çi bikim?!
_ para kum bike,xanî zeviya bikire..
_ min pê çê nabit.
_ hevalên te diniya xwarin!Tû çi dikî?!

_ helu.... Helu...?
***
_ min çidigûte te?!
_ ez tênagehim?!Ka heval û bîrhatinên me?!
_ roj hate gihurîn.Jiyan hate gihurîn.Mirov jî...
_ ne bêje mirov jî hatin gihurîn...?
_ tinê mirovin bisanahî diênegihurîn.Şev û roj her wek xûne!
Serê xu yê giran hejand.
hevalê wî zanî barê wî yê girin dibit.
_ ne...Hişiyarbe,wek geleka ne bêje,ez peşêmanî wan roja û wê zehmetê me?!
berê xu da binê esmanî,herweku litiştekî berze digert.
104
_ min liber geleka,çu nekiriye.Ez çucar peşêman nabim. Min ne jibû malê diniyayê
şoreş kiriye.min ne jibû çu kesa şoreş kiriye.Şoreşa me jibû azadiya milletekî bû.
Jibû welatekê serbixû bû.
_ erê, welat azad bû,lê em hatin jibîr kirin..!
_ dibit,lê liberamberî biçûkên şehîda,me çu nekiriye.
_ tinê xema min ewe...Xudan şehîd û xudan şiyan û ewên zehmet dîtîn,ne êne jibîr
kirin.
_ jibîr bike.Hilû da te bibime cihekî,tû diniyayê bixemên wêve jibîr bikî...
_ herwekû min şoreş bû te kirî...!
_ min gûtete,hemûyê jibîrbike.
_ min jibîr kir..
_ dê hilû, karê xu bike..

_ ez amademe.
***
Welatên ava û bixudan.Jisiroştê wê diyare.Çiya,rê û cade,daristan xizmeteka dirust.
Xemên milleta sist dikin.Kes xema nan û tenahyê na xut. kes jibirsa tuşî xeletiya
nabit.Çavê hemûyan lipêşvebirina jiyanê ye,hemû lihîvîn geştir digerin,pêtivî
nakit,mayê xu dihemû karên siyasetmedara da bikin.
Jiyan wek demjêra ye,ne bikêm razî dibit,ne bizêde.
Liber lêva robarekê zelal ronişt.Pêlên avê hizirên wî digel xu jorda birin.
Cih bê denge,şirre.Ew qêriyên jipêlên avê diên,wek mezîqeka xemgîn,bezê mejyê wî
dihelînin.
Hevalê wî yê biwê kiça dikuşê da mijûyle.çîhan ya rawestiyay,tinê hindek caran deng
jihindek pêlên har û dengê hevalê wî û wê kiça dikuşa wî da,û hindek cara ew çoçkên
şûym,dîwanawî dişêlînin.mêvanên wî sil dibin.
Mêvanên biha giran,hevalên xoştivî,zû dizifirin.Kêm caran dîwanawî ya valaye.
***
105
_ dê kengî min xwazî?Ez neşêm êdî digel te der kevim.
_ xwaztin..?! Tû baş dizanî,ez dê gehime şoreşê,dibit jiyan linav şoreşê bizehmet
bit...!
_ bila.. Ez jî wek te.Min jî ew welat divêt,ez jî dê wek xu xebatê kim.

_ wek xu..?! Ew çewa?
_ belê..Heker min xizmeta te û ya hevalên te kir?Eve min jî beşdarî dişoreşê da kir,ma
tû nabêjî,şoreş ne tinê çekdarîye?!
_ raste.. Raste.. Lê..
_ nebêje lê..Wesa diyare tû yariya biviyana min dikî. Tinê demê xu diburînî..
_ ne.. Bes wê nebêje.Ez jigiyanê xu pitir hez jite dikim.
_ heker rast bit,min digel xu bibe nav şoreşê.
_ ez ditirsim tû peşêman bibî.Tûya fêrî paqijyê û xwarina xoş û ronahyê bûy.
_ ewên linav şoreşê,hemû kur û kiçên dayk û babanin. kes jibin bera nehatîye..
_ erê.. Weye..
_ tinê te dû helbijar hene..Min jibîr bike..Yan min digel xu bibe...!
_ herdû helbijar dizehmetin,tinê min dem divêt,heta karê xu bikim...
Dengê dû firokên şerî lihindav serî agir jê dibarî..
Cih kire agir û barût.Her kes birexekîve revî.
Dengê biçûk û jina tijî gelî bû.
Lipişt xu zifirî,diviya litina wan biçit,diviya liyara xu bigerit.
Hevalê wî bikeniyeka sar ve gût..
_ hilû, gerate ye..
Serê xu bilind kir,jineka nîv rûs,mirov jiciwaniya wê têrnabit.Ya qebê wî dixwazit..
_ bila gera min jî bû te bit.
_ xêre dîsan?!Vî robarî tû kîve birî?Çi bû te gût?
_ ez birime pîroztirîn cih,pîroztirîn dem,pîroztirîn bîrhatin..
_ berê xu bide pirça wê,bejna wê,paxlên wê.ya qebê te dixwazit..

_ hindek tiştên dî jiwê dijwartirin,yên qebê min dixwazin.
Eve ez çûm,bila bû te bit..
106
_ dê kîve çî?Em gelek jibajêrî didûrin,dîsan dê berzebî..
_ dê bipiya çim.Gelek cara min dûsê cara pitir daye ber sîngê xû û ez ne wastiyay
me.Ma jibîra te çû?
_ raweste,eve ne ew roje ,û tû ne ew mirovî.Raweste em jî dê ên..Te roja me têkda..
***
Firokên şerî,jorda çûne xwarê,agir vemirandin,dukêl sist bû,diniya şirr bû,kitkite jibin
ber û taraşa hatine der.
Her êkî biçûkên xu hijmartin..
_ ka kurê min?Ka kiça min..? Ka birayê min..?
Bêhna xwînê tijî gelî bû,leşên wan licihekê vala kum kirin lidura bûne kum.
Pirça wê ya dirêj,dinav kelexada ya diyar bû.Dayka wê xu havête ser parçên leşê wê.
Hemû man lihîviya wî,çavên wan jiçavên wî venebûn.
Hemû çîroka wan dizanin,hemûyan viyana wan pê xoşe.
Girî bilind bû,hevalên wê liser leşê wê kirine dîlan.Gelek dayka,leşên biçûkên xu
hêlan,û liser leşê wê behiya xu danan!
Çavên gondiya zîq man biçavên wî ve.Girî bilind bû.
Dengê wê diserî da deng vedida..
_ te ez û şoreş yan min jibîr bike..
_ hemû dizanin,ya dinavbera me da..

_ ez şerm jibab û birayên xu dikim.
_ viyana me bike rastî.Diyar bike da biazadî viyanê bikin.
Neşiya xu pitir ragirt,agir kete nav hinavên wî,lerizî,gêş bû,bihemû hêza xu kire
hewar û xu havête ser parçên leşê wê yên hêşta xu jê diza...!
Kes nema liser hişên xu,çavên hemûyan tijî rondik bûn. Rewşit û tîtalên kirêt jibîr
kirin.
Hemûyan evînî bitiştekê pîroz zanî,hemûyan xuzî
dixwastin bibine evîndar..
107
***
Dengê giriya wî,biser ket.Hevalê wî lêvên wê kiça wek benîştî dicûyt,berdan.Destê xu
dana ser milî,zanî yê zifirî ye rojêt pîroz..
***
Liber derê malawî turmbêl rawstand,xu jê havte der, bêy xatir xwastin,qesta mal kir.
Limal biçûkên wî lihîviya wî ne,gelek kar lihîviya wî ne, gelek kaxez libenda îmza wî
ne,geleka pirsiyara wî kirîne.
_ tû likîve bûy?Eve gelek çara cihê karî pirsiyara te kirin. Tû bû naçiye karî?!
_ ez neşêm çu kara bikim.
_ dê harîkariya me birin,heker tû kar nekî.
_ serê min bibirin ez neşêm kar bikim.
Biçûkekî,şeredeva wan bidawî îna.

_ bab,eve gelek cara Mamustaya me daxwaza amadebûna te kir,tû bû rojekê wek
babên hemûyan na êye xwandingeha min?!
_ min çu pê çê nabit bû hewe bikim,ma dê ême çi?
_ divêt her êk jihewe amadebit.Tû yan dayka min.
_ bila dayka te bêt,ez yê nesaxim.
_ divêt tû van kaxeza îmza kî..
_ bila dayka te îmza bikit.
_ divêt tû...
_ bes baxivin,ez çu kara nakim..
Daykê da bersîngê xu û jijorê bire der.
_ jê bigerin,yê wastiyaye,dê ête ser hişên xu.
Çavên biçûka man zîq heta reşatiya Daykê berze bûy.
Her êkî qesta jora xu kir,man hilawîstî bidavên hizrave.
Liser cihê xu yê nivistinê,xu dirêj kir.
Zanî hestê kurê xu birîndar kir,zanî dilê jina xu hêla, zanî yê bûye girê dimala
xuda,zanî êdî gelek tişt pê çê nabin,zanî jiber bê loqiya wî,dê mala xu toşî gelek
nexuşiya kit.
Dengê dergehî,hizirên wî yên kirêt,belavekirin.
xu diber kelexê wî yê wastiyay da dirêj kir.
108
_ tû her serwerê vê malêy,tû her dê mînî bab û heval û yar û hemû tiştên me.Ez
dizanim tû yê wastiyay.
lê bibure,biçûk wê çendê nizanin.Ev welatê nanî didite me,wê çendê nizanit.Tinê tû

xu ture neke,xu ne wastîne. Ez dê hemû karên malê kim,ez dê jipêş teve çime karî. Ez
dê çime xwandingeha biçûka,ez dê bihemû kara rabim.
Min nevêt tû nesax bî,min nevêt tû jimin dûr kevî.
Ez bêy te najîm.
xu qolpande ser piştê,berê xu da wan çavên tijî hîvî,wî dêmê hêşta jiyan jê dizêt.
Destê xu havête nav tenga wê,kêşa ber sîngê xû, givaşte nav dilê xuda.
Piştî demekî dirêj,jinê jipşitve dergeh girt û xu havête dibin lihêfa wî ya germ ve.
_ 12 _
Spêde baş..
_....
_ bibure,ez dişêm rûnim?Ez yê nesax û wastiyay me.
Berê xu da bejna wî ya ne lêkiday.
_ tû wastiyayê çî?Hindî tû dinivî?Yan hindî tû karê reş dikî?!
_ bawer bike,ez ne dinivim û ne karê reş dikim.
Keniyeka girêt jilêvên wê yên nazik der ket.
Neşiya xu bigirt,karê ronştinê kir..
109
_ ne rone...!Min izina roniştinê ne daye te.Eve ne cihê roniştinê ye.Vê kaxezê bigire û
der keve..
_ kaxeza çî ye?
_ nav û nîşanên karekî ne.Divêt tû sobehî zûy liwî cihî amadebî, jibû kar kirinê..
_ tû baş dizanî,ez neşêm kar bikim.
_ tû jî baş dizanî,heker tû kar nekî,em dê harîkariyate birin.

_ lê ez yê...
_ bibure,min dem nîne digel te dirêj kim.Hemû tişt diwê kaxezê da dinivêsî ne.Yadî
liser te dimînit.Geremke, derkeve.
wê şevê,heta berê spêdê,xew jê sil bû!
_ xu ture neke,karên dewletê bisanahî ne,tinê xu mijul kirine.
_ ez neşêm çu kara bikim.
_ tû yê zîrekî,xu bes bêxe,tû dişêy hemû kara bikî.
_ ez ne biçûkim!Tû min na xabînî.
_ bawer bike,nihu tû jitulazekî bihêz tirî.
_ tulaz...? Ez kirine tulaz..!
_ û jibabê tulaza jî bihêz tirî...
tijî nav çava bişkurîn bûn.
_ heker min tu nebaye,ez da berzebim...
_ heker minjî tû nebaye,ez da dîn û har bim!
xu havêtine êk.Ketin diviyaneka dijwarda.
Wan çend demjêrên mayn bû spêdê,biramosan û viyanê ve burandin.
_ min negûtete!Tû jitulaza bihêz tirî?!
_ hilû karê min bike,da biçme karî..
_ iha wesa,min divêt tû yê zîrek bî.
_ ez neyê leş saxim.
_ xu mijîl bike,bikarî dê giyanê te pitir tena bit.
Dê mejyê te zelal bit.Kar tendirusitî ye!
_ bila dixtura min!
***
110
Hevalên wî yên karî,hemû dikalin,hemû dinîve mirovin. Seqet û kêm endamin.Fêrbûyên dermanik û kihulê ne.

Çu kar jikesê naêt,ew xoş mêrê hemûyane.
***
_ tû dê biye serkêş û rêberê me.Mêraniya te,zîrekiya te ya berçave.Her biriyara tû
bidî,em dê bicih înin.
_ sopas bû hestên hewe.Em hemû birane,em hemû rêberin,ez bihewe mêr û
zîrekim.Herkes jihewe têbîniyek hebit,em dê godariyê kin.Karê me karê komêye.
***
_ karê me yê evro,piştî hûn cigarên xu dikêşin û bîrên xu vedixûn.Em dê qopkên
cigara liber lêva cadê rakin.
***
_ karê me yê ev şeve,piştî em cagirên xu dikêşin,ça xu vedixûn.Em dê xu berdine nav
dilê dujminî,liber lêva cadê û lirexên sengerên dujminî,dê jimîna paqij kin,da li berê
spêdê jibû hêrişa me amadebit...
***
Çend carekê ew bejna bilind û wastiyay diçemande qopkekê cigarê,yan pirteka
kaxezê,şevek û rojek jijiyê wî disotin.
Her çendekê lidur xu dizifirî,ka kes nabînit!Ka kes pê nakenit!
Hevalên wî,her çendekê bêhna xu didin,cigara dikêşin, vexwarinên kihulî
vedixun.Dibite kenî û sohbeta wan.
Ew her yê bitinê ye,yê bê hevale,yê berzeye.Digel giyanê xu yê havî ye!

wê êvariyê,careka dî,piştî demekê dirêj hest biêşana hindek gehên leşê xu
kir.Wastiyana vê carê,newek hercare,wastiyana vê carê,tameka taybet jê di êt.
Taybetmendiya wê,jiber nazdariya wî ye.
111
Vê carê,hest dikit biçûkekê savaye,xu nazidar dikit bû jina xu.
Jin,bihemû şiyan û şarezaya xu ve,ya liber xizmeta wî rawestiyay.
Eve demekê dirêje,husa hest bixoşyê nekiriye.husa xu nazdar nekiriye.
_ leşê te sax.Te çewa kar dît?Roja te çewa bûrî?!
_ ez bikarî ve mirim,ez neşêm xu liserpiya bigirim.
_ diyare karê hewe yê bizehmet bû?!
_ her jispêdê heta êvarî,em liser piya dirawestiyay bûn.û qopkên cigara liber lêva
cadê kum dikirin.
Bişkurînê dêmê jina wî girtin,zanî nazdariya wî ne ya wastiyan û karî ye.
_ malate,dê fêr bî.Tû jî xu hind ne wastîne.
_ madê jinû fêr bim?!
_ erê,Ma min ne gût,tû tulazî!Dê her liberdilê min tulaz bî.
_ pîrate diêt?Demê min hevt heşt gond didane ber xu, çend çiya û rê dipîvan,Heta
dihatime seredana te . Jibû dîtina van çava?!
_ ez çucar wan roj û şeva jibîr nakim.Ez ya biwan bîrhatina dijîm!
_ hizar xuzyên wê jiyanê.
_ ka xu dirêj ke,da pişta te vemalim.
_ xuzî...Wek wan rojan.bivemalîna pişta min,ew êş û wastiyan vedrevîn!
_ ew ne bitinê jiber vemalîna piştê bû!Ew jiber hindek egerên dî bûn!
_ egerên çi?!

_ jiber viyana te bû min bu, jiber viyanate bû welatî bu, jiber baweriya te bikarê te
bu...
_ raste..Te rast gût!Lê nihu jî min tû jigiyanê xu xoştir divêy.
_ ez bawer dikim,lê te giyanê xu jidil nevêt.Giyanê te yê li te bûye bela!
_ ewjî raste.. Weye..
serê xu hejand,çavên wî ketin ser êk.Wan til û destên nerm.Giyan jigehên wastiyay
dizîn.Bê deng bû,xirênî jigewriya wî hat.
Hêdî lihêfa wî biserdada,dergeh girt,hêla dinav pêlên xewê da.
_ kes dengî nekit.Babê hewe yê nivisitî!
Biçûk hêbetî bûn,eve caraêkêye,babê wan berî wan dinivit!
_ da..? Dayê..?!
_ min gût dengî nekin!
Devê xu bire bin gohê dayka xu,bidengekê nizim ve.
_ babê me xêre?!Ma yê nesaxe?!
112
_ ne dayê,yê wastiyaye.Evro çubû karî.
_ kar..?!Mala xudê ava,babê me kar dikit.Tû dizanî dayê,em lixwandingehê şerim
dikin,dema dibêjin babê hewe yê bê kare?!
_ raste kurê min,lê babê hewe yê nesaxe,û zimanê wan baş nizanit,kar bû yên wekû
wî dikêmin.
_ ez dê sobehî bêjime hemû hevalên xu, babê min kardikit..
_ hişiş, bê deng bin,herin hûn jî bixwînin,da zû binivin.
_ hêşta zûye,nedemê nivistinê ye.
***

mal bê deng bû,livîn nema,jor tarî bû,xew bû kabûsekê dirinde.
Bejna hevalê wî Husên,lipêşiya wî,bibû kêl.
_ Ma me çi gûtbû?!
_ me çi gûtbû?Bîra min naêt?!
_ Ma me ne gûtbû,em dê tola turmbêla xu likiçên pirag vekin?!
_ ma kiçên pirag turmbêla me dizî ye?!
_ ne..Lê birayên wan ya dizî.Û em jiber wan çûbûne pirag!
***
Derê jorê vekir,yê dinav xoha leşê xuda ter Bûy.
Neviya jixewa şîrîn hişiyar bikit,jor bû hêla,çû dijora biçûkave,liber tenişta kiça xu
nivist.
***
_ karê xu baş bike,eve ne wek her care,eve xwîndariye, tol vekirine.
_ te carekê direwek ya limin kirî!
_ direwa çi?Ez direwa lidiniyayê hemûyê bikim.Ez lite nakim?!
_ te kûtibû,dê te bime pirag licihekî,tû nizanî kî jikê ciwantire.
_ iha min evro ew libere.
_ iha ez jî jidil amademe.
Li cihekî dûr jibajêrî,liwarekê bê deng,bê mirov, lixaniyekê bitinê.bûne mêvan.
Dergeh vebû,dû çavên şîn,wekû yên pişîka,dû lêvên sor û tijî bişkurîn,pirçeka
zer,bejneka bilind.Pêşwaziya wan kir.
_ keremkin..
çavên wî jê venebûn,lipişt xu dizifirî,neşiya biçite jor.
113
_ were,ew kirêta hemûyan.

lijoreka mezin,pitir jideh kiçên bijare.Her weku jibû berîkana ciwanên cîhanê
helbijartîn,diamadene.
Hemû jipêşve rabûn,her êkê,wek xu pêşwaziya wan kir.
Lidur xu zifirî,berê xu da wê jora ciwan û lêkday.wan kiçên jibaxçên biheştê
înayn,hest bimirinê kir,
_ ma ez mirî me?!
_ nene, tû yê saxî.
_ pa eve çi huriyên biheştê ne?!
_ eve biheşta ser diniyayêye.
_ Mela Elî digût,tinê biheşt ya libin diniyayê.
_ wî vêrê ne dîtiye,lewa we dibêjit.
_ digût,libehştê bitinê hurî hene,û her biheştiyekî,dê çil hurî gehinê..
_ eve biheşta mine,heker te bivêt,dê sed huriya bû te înim?!
_ biheşta te hosa ya xuşe.Pa cehinema te ya çewa ye?!
_ licîhana min,cehnem nîne,tinê biheşte û biheşte,û biheşt!
_ tû xuda bendekê dil nermî..
_ dê,heker tû rast yê şarezay,dê bêjiye min kî jihemûyan ciwan tire?!
çavên lê zîq bûn.Hemû bejin,hemû pirç, hemû dêm. Dûsê carî dimejyê xuda tumar
kirin.Hindî hizirên xu cemandin.Neşiya biriyara xu bidit!
_ te rast gût,te belêna xu bicih îna,ez neşêm bê bextyê bikim,ez neşêm çu biriyara
bidim.
_ tû dişêy bû xu êkê jê bigirî?
_ ne bawer bike,ez yê mayme heyrî.
_ were jor,ma dê liber degehî bî?

duwa milên wî girtin,kirine dinîva xuda.Bendujkên wî û yên xu pêkve vekirin.
Xoha leşê wî gerim bû,livîna endamên leşê wî zêde bûn.Rûs kirin,dengê mezîkê
bilind kirin,xu jî rûs kirin.
Nêr bû,har bû,kete dişerê evînê da.Pitir jinîva wan huriya,ketine dişerê man û
nemanê da liser sîngê wî yê lawaz!
Deng jê hat,Balîvk kivaşte dinav sîngê xuda.
Bû gulmçkeka befirê,dinav destên wan kiça da.
Bû şere befira wan.yarî pê kirin,dinav dest û hestên wan yên nazik da heliya.
Xoha leşê wî kel bû,nêratiya wî har bû.
Diviya bikite hewar,wan kabusên leş sipî û nazik,deng lê mit kirin.
114
Heçiya gulmça befirê dikete didestî da,dilêvên xu yên şirîn,dihusî û dinav memkên xu
digivaşt û difirande nav pirça hevala xu!
Kete zifiruka leşên nazik da,her yê dihelyêt.Her kenî û yariya gulmçanê ya dijwar
dibit.
Ew pirtên vedipeşîn.wê kiça jihemûyan biçûktir,lêkdan, û kirine gulmçkeka biçûk,û
bûxu bidizîve bire joreka bitinê,liser sîngê xu yê çarde biharî givaşt.
Neşiya xu dibin wî kabûsê giran ve bigirt.Hest bihelînana giyanê xu kir.Bihemû hêza
xu kire hewar.Rabû ser cihê xu,bêhin teng û wastiyay.

Dest da pêsîra xu,ya ter bûy.Liser milê xu zifirî,cihê jina wî yê valaye.Gazî girê,kesê
bersiv neda,mal lihîvya wê, gîru bû.Firek liwê ava libin serê xuda.Rabû lijorên dî
geriya . Lihêf biser biçûkên hilêvirî dada.
Dijorekê ve,jina wî ya birex kiça xuve xu kiriye qormik. Lêvên wê yên hişik bûyn.
Zanî,ew jî êxsîra kabosekê kirête.
Destê xu da pirça wê,liser rûyên wê veda.Dûsê cara rûyên wê vemalîn,jixewa
giran,hişiyar nebû.
Diviya liber tenişta wê binivit.Cih nebû,diviya hişiyar bikit, dil neda.Diviya hindek
çîrok û pêkenîna bû vegêrt. Diviya daxwaza lêburînê jê bixwazit.Diviya liser sîngê wê
yê tijî tenahî û hîvî bikite girî.
Çu pê çê nebû.Gelek lihindav serî rawestiya.Gelek bîrhatin,hatine bîrê,digel xoşî û ne
xoşiya firî,geriya,jiya.
***
_ ez dizanim te yarek hebû!Digûtin gelek ya ciwan û berketî bû.Cihê wê biheşt
bit.Hîvîdarim ez bişêm hindek jiviyana wê didilê te da peyda bikim!
_ we ne bêje.Tû nihu licihê xûy didilê min da.Ew çu, viyana wê digel wê çu.Her tiştekî
wê bûne bîrhatin.Ez goneha te nakime stoyê xu.
_ te ez weku wê divêm?!

_ jiwê pitir.Min ew her jidûr didît,û hindek cara bidizîve. Hêşta tinê ya dinavbere
meda,viyan bû.Lê tû..Nihu tû ya dinav dilê min da dijî.Tû beşekê giyanê minî...
_ eve xuştirîn peyvn min dijiyana xuda guh lê dibin.
_ dê peyvên xoştir goh lê bî!
_ wek çi? Ez bawernakim,peyvên xoştir hebin?!
_ wek peyva dadê...
115
_ dadê...?!Tû bêjî dê carekê min goh livê peyvê bit?!
_ heker te bivêt da vê gavê karê wê peyvê bikin!
_ çewa?!
_ iha hosa...
xu havêtê,liser wî giyayê biharê jorda diwê nihala tijî giya û kulîlik çûne xwar,dinav
pêlên giyay da berze bûn,tinê keniya wan biser giyay diket.
Xoh bibû pêlên deriyayeka dijoar.
Nivîn,daralînekeka asêne.Kabos,her yê giran dibit,xew her ya dijwar bidit.Endamên
leşê wê her yên sist dibin.
Berevanî jê naêt,hewarawên wê biser nakevin.
Wek wênegirekê şareza,ma lihindav serî.Zanî ya dinav destên hindek dirinda da,zanî
şer pê çê nabit,zanî çu nemaye dê xendqit.
Destê xu limilî da û hejand.Şer dijwar tir bû,ageh jiçu nema.Her milê wê hejand,her
şer dijwar dibû.

Biherdû desta milên wê hejandin.Bi hemû hêza xu kire hewar û rast rabû ser cihê xu.
Jor,rûn kir,biçûk jixew hişiyar bûn.Hate ser hişên xu, hindek ayat xwandin,hindek av
vexwar..
_ te xêre?
_ ew çi bû?Ez likîveme?Tû bisilametî?
_ çunîne,wesa diyare xewin bû.Xewneka kirêt.
_ kirêt û bes...!Çunemabû ez şêt kirîm.
_ bêhna xu vede.Hilû da biçine jora xu.
_ erê..Min ev biçûke jî bizdandin.
berê xu da kiça xu ya zer bûy jitirsan.
_ binive kiça min,çu nîne.ne tirse..
daber sîngê xu û givaşt,bêhna wê hat,dilê wê kêmtir xu qota.
_ texêre?Vê nîv şevê bû tû yê hişiyarî?!
Kenî..Jidil kenî,xwîn lihindek gehên dilê wî careka dî geriyan.
_ eve demekê dirêje,tû hosa şirîn û jidil nekenî?Xêre, xudê xêr kit?
_ xêre... Min jî wek te xewnek dîtibû.
_ ew çewa?
_ lê ne wek xewna te ya kirêt bû!
116
_ mala xudê ava,kafir xewnên wesa ne bînin.Ê? Te çi dît, wesa dilê te xoş kir,heta tû
wê kenya ez gelek jê xerîb bûy,berdî?
_ ez şerm dikim bêjim!
_ şerim..?!Xewnên şerimîn jî hene?
Kenya wî jidil hat.
_ eve pitir jisîh salaye,min xewnên hosa nedîtîne!

_ wey babû!Ew çi xewne?Te bû min kire mereq?Dê ka bêje?
Destê wê kire pêsîra xu.
_ eve çî ye?!
Devê xu bire bin gohî..
_ şeytan yê hatî ye min!
herdû jidil kenîn,keniya wan tijî jor bû..
_ bixodê tû linik min nanivî,heta tû serê xu neşoy.
_ wila tû heqî.Eve ez çûm serê xu bişom.Lê te xewna xu bû min ne gût?
_ te jî xewna xu bidirusitî negûtî ye,here serê xu bişo,û were , em dê çîrokên xu kine
ser vî textî !
ma bitinê dijorve,hêşta tijî leşê wê vayrosa tirsê ye.Jor bê deng bû,dîwar bidev û
didan ketin.
Banê jorê bû zikê firokeka semtî.Agir jê barî.Textê wê bû gorstan.inkîr û minkîr jibin
derketin.
Diviya bikite hewar.Tirsiya,diviya birevit,pêstîrkê girt.
Hişik dicihda ma,çavên zîq,devê beş,bêhna çik,livîn jê nehat.
Dengê zelamê wê,ji serşoyê,jinav wan devên xwîn jê dibarî qortal kir.
_ dilê min...Bibure.min xaweliya xu ya jibîr kirî.Dê şêy bû min xaweliyekê înî?
ew dirinde hemû revîn,xu veşartin.Hişên wê kum bûn.Xu jitextî havête xwar,bihemû
şiyana xu kire xar.Qesta serşoyê kir.Bicilkên nivistinê ve,xu havête mêrê xu yê rûs
dibin şirka avê da...
mêrî zanî neya liser hişên xu.

_ te xêre?
Xu dinav sîngê wî da pitir şidand,leşê wê jiserî heta binî dilerizî.
_ wesa diyare,tû ya jimin xerîb bûy?Dê van cilka bêxe, da pêk ve serê xu bişûn.Eve
demekê dirêje,me pêkve serê xu ne şûştiye.
Serê xubilind kir,tijî navçavên mêrî,bişurîn Bû.
Neviya wî jî bitirsînit.
Mêrî jî her mijûl dikir,da tirsê jibîr bikit.
117
Wek dû evîndara,kitkite,cilkên wê jiber kirin.Pêkve dibin şirka avê da gohnêliya xu wê
nîv şevê kirin.
Xu berdane dinav birka tijî avda û xav bûn.
Tirs û xew û kabos,digel pêlên avê çûne xwar.
Ew dirindên kirêt,bûne rovên pirsî.Jiber şêrê evînê revîn û xu veşartin.
Diviya jinav wê birka avê derkevit.Nehêla,newêriya. Ditirsiya,hêşta ew dirinde dijora
nivistinê da lihîviya wê bin.
_ te nevêt em jivê avê derkevin?
_ ne... Em dê têda bin,heta sipêdê.
_ dê nihu biçûkek jixew rabit,û ête dest avê.Dê me hosa bînit.
_ bila...Mae jiçi çêbûyne?!
_ erê.. Lê...?
_ hişiş...Ez hosa dikuka xuşyê da jîm!
_ ez jî...Lê bû me dest nadit.
_ şeve,biçûk dinivistîne.
_ xozî te ya dilê xu bû min gûtba?Kate xêre?!
_ bîra min ne îne...

_ divêt tû bû min bêjî,da dilê te tena bit.
_ bila...Paşî, jimin bigere,da têr te hembês kim.
_ te ez xwarim,min girê te nîne.
_ eve jidohî heta evro,tû sê cara bûye zava.Ez bigirim yan tû?!
_ mate negût,tû hêşta tolazî?
_ erê û dê her liber dilê min tolaz mînî.
Gelek wesa man,gelek hizir kirin,dinav gelek bîrhatina da jiyan.
Zanî ya liser sîngê wî yê rûs,û dinav birka avê da dixew çûy.Zanî ya ketiye dinav
pêlên xeweka giranda.Dil neda hişiyar kit,dil neda xu bi livînit.Av sar bû,diniya rûn
bû.
Hest kir,yê bûye gencekê bîst salî.Lê qeda birojê bikevin,çu nemaye dê serê xu
hildit,dê biçûkên wan hişiyar kit,dê demê karê wî êt.
Dengê xewê hêşta jikuratiya dilê wê dihat.
Dûsê cara hewil da hişiyar kit.Hişiyar nebû.
Dengê zenga demjimêra biçûka herdû êxistine deravê lezê.Karê xu kirin,û birutî ve
qesta jora xu kirin.
Berî biçûkek derê serşuwê lê vekit.
118
_ em nivistbûn?
_ tû nivistbûy.
_ û tû?!
_ ez jivanê te bûm.
_ weku berê,lidemê şoreşê?!
_ erê,weku wî demî.Tijî durên me dujmnin..

keniya wê,ya mê bû.Xu havête nav sîngê wî.
_ te bû ez hişiyar nekirim?!
_ min dil neda..
_ te dil neda..?Yan te pê xoş bû?!
_ herdû.
_ heker êk jibçûka hatiba serşûyê?
_ da bêjit,dayk û babên me yên bûyne bûk û zava.
Keniya wan tirs jijora wan dûr kir, jiyan hate cihê tirsê.Tijî mala wan deng û sohbet
bû.
Biçûk jixew rabûn,karê xukirin.Xanî bigiyan ket.
Biçûka hest kir,tiştek nû limal peyda bûye?
_ eve em çûn, bixatira hewe.
_ bixêrbçin,gohê hewe liêk bit!Gîro ne bin!
nediviya evro jimal derkevit,nediviya bimînte bitinê.
_ û tû? Matû naçî ye karî?!
_ evro ez te nahêlim bitinê,ez dê xu nesax kim.
_ çu roja wek evro ez jite xerîb nebûyme!Min nevêt tû jirex min dûr kevî.
_ ez jite dûr nakevim,pişt rast be.Dê te evro mêvan kim, karê xubke,em dê çine
derê,çine geriyanê linav bajêrî.
_ ev çi xoş hizir bû?Tû heta nihu likîve bûy?!
_ ez hêşta jidayk nebibûm.
_ dê hilû karê xu bike.biçûk çû piştî nîvro êne mal.
_ erê.. Em dê evro bidilê xu kevin.
_ evro bitinê...?Yan dê hindek rojên dî jî hebin?!
_ soz bit jievro pêve rojên me hemû xoşî bin.

_ maç jime kême?Divêt em rojên xoş nû kine ve.
119
_ 14 _
_ spêde baş..
_ geremke..?
_ min divêt Mamustay bibînim.
_ te jivanek heye?
_ berî çend heyveka,wî gûtbû min,tû dişêy her demê te bivêt,seredana min bikî!
_ bibure,eve ne cihê seredana ye.Eve cihê karî ye tû dişêy limal biçiye seredana wî.
_ eve deh cara ez çûm,dibêjin ne limale.
_ ankû,nevêt te bibînit!
_ nene,bawer bike,em gelek hevalên êk bûn.
_ hevalên êk...?!
Keniya wî serinca mêvanên lihîviya Mamustay rakêşa.
Gelekên dî jî,tijî ser û çavên wan kenî û bişkurîn bû.
_ erê..Bawer bike,gelek şeva em pêkve libin berekî nivistîne,û gelek cara me nan û
pîvas pêgve xwarîye.
Kenî tijî pirsgehê bû,kabray şerm kir,devê xu bire bin gohê mêvanê giran.
_ eve ne cihê yarî û sohbeta ye!Min demê van sohbetên çivêl nîne.Keremke
derkeve,mêvanên piyanî yên li vêrê!
_ lê...?
dengê xu bilind tir lê kir.
_ derkeve.

_ bes navê min bide Mamustay,ew dê jipêş min ve ête derê.
_ heker tû ne derkevî!Dê gazî zêrevana kim,date bikine derê..
***
_ eve tû carekadî hatî?
_ divêt ez Mamustay bibînim.
_ te çi jiMamustay divêt?
_ kaxezên min yên berze bûyn.
_ ez bawernakim Mamustay dîtbin!
120
_ ez jî bawernakim.Lê ew min diniyast.Ew dizanit ez kîme.Ew dişêt harî min bikit.
_ tû dişêy hindek kaxezên dî dirust bikî..
_ dê salek pê çit.
_ bila.Matû lezê çî?!
_ ez xudan biçûk û karim.
_ hewe kew jî divêt,û xew jî..
_ tinê me mavê xu divêt,bihayê wan rojên jijiyê me burîn.
_ çu tişt bû ewên liderê nîne.
_ berê jî digûtin,çu tişt bû ewên kes û karên wan liderê nîne!
_ nuke te çi divêt?
_ tinê bêje Mamustay,ez yê livêrê û...
_ eve min deh cara gûtê..
_ ê..?!
_ demê te nîne.
_ demê min nîne?!
_ erê..
tijî devî kenî bû,serê xu hejand.

_ lirojên tengaviya,demê mala min bû wî vekirî,demê min hebû!Dema min nan jidevê
biçûkên xu diîna der û dikire didevê wî da!Demê min hebû! Demê heta sipêdê ew
dinivist û min zêrevanî lê dikir.Hingê demê min hebû...!
_ çê..?! Tû çi dibêjî..?!
_ çine... Çine...!
***
_ spêde baş.
_ baştir.. Keremke..?
_ bibure,min diviya silavekê bikime Mamustay.
_ silavekê..?!Silavate gehişt.
_ ew çewa?!
_ belê...Silava te gehişt,û xudê digel te bit.
_ min divêt bibînim!
_ te divêt bibînî?Ya silavekê bikyê?!
_ ma dê çewa silav kimê,bêy bibînim?!
_ bibure, mêvan yên heyn.
_ tinê navê min bêjê.ew dê ête derê lipêşiya min.
Kenî tijî golanê bû.
_ wey babû,tû gelek yê jixu razî?
_ em hevalên êk bûn.
121
_ libaxçê zaroya?!Yan lizankwyê?!
keniyeka bilind jihemû zêrevana biserket.
_ hûn baş dizanin,Mamustay,ne baxçê zaroya dîtiye.Û ne zanku. Em....!
_ bes...Wesa diyare tû biezmanê xoş jivêrê naçî?!
_ wesa diyare,ez dê vî welatî hemûyê bû hewe hêlim!

_ dûrkeve... Em te livê gulanê ne bînin...
***
_ bibure heval,ez çi bikim?!
_ ez nizanim ka te çi divêt!
_ ew salên jijiyê min bûrîn?Ew birînên lileşê min?Ew nexoşî?Ew xebat?Min nevêt
hinda bibin!
_ pirsiyara mavê xu bike.
_ pirsiyara kê bikim?!
_ hevalên xu.
_ hevalên min ewên kar pê çê dibin,yên bûyne ji (meçêtir)kes nabînit!Ewên wek min
çu pê çê nabit!
_ binivêse..Bihinêre cihên taybet.
_ kesê demê xwandina nama nîne,dibêjin tû yê ji derve.Çû tişt bû wan kesên jiderve
nînin.
_ raste.Were bizifire.
_ ew çewa?!Lidemê şoreşê digûtine kes û karên me çû tişt bû hewe nînin,hûn xo
firoşin mirovên hewe yên liderve!
Nihu her wê çikyê didine navçavên me.Kes nabêjit jiber çi em lidevene?!Em jiber kê
lidervene?!Madê heta kengî mînine liderve?!Kes van pirsiyara nakit.Kesê nevêt
mirov jî van pirsiyara jê bikit!
_ bibure,eve hûye,biriyar ya linik te.

_ ez ne dixema wan salanim,ez ne dixuma jiyê xome. Min jibû xizmeta welatê xu
sotîne.Lê ez dixema biçûkên xume,min jihemû tişta kirin.Jiwelat û kes ûkara.Û liwêrê
jê min nehêlat wek wan vêrbibin.
_ bizifire.Hêşta te biçûkên xujî jidest ne dayn!
_ min çu nîne pê bijîm,dê livêrê jî jidest min derkevin.
_ te serê min lê kire êş.Bibure divêt ez biçim...
_ 15 _
122
_ belê?Keremke?
_ êvar baş..Hûn çewanin?Başin?
_ sopas kak Husên.Hûn çewanin?Biçûk çewanin?
_ zor sopas.Em gelek dibaşin.Bibure,kak Hesen limale?
_ belê, yê limal. Lê...
_ çî ye? Xêre? Neyê nesax bit?!
_ gelek jinesaxyê xirab tire!
_ te ez tirsandim!Wî xêre?!Çi buye?!
_ bibure kak Husên.Tû hevalê wî yê nêzîkî,lewa min tû pê hesandî.Hîviye bila nezanit
te sohbeta jimin ya zanî.
_ ne tirse,ez pênahesînim.Lê ka bêje wî çî ye?!Ez dê evro litana wî êm!
_ nene,pêtivî nakit tû xu biwastînî.Tinê hindek gazinda jê bike.Bila biçite derê,bila
bigerit,bila kar bikit.Jikuna xanî dernakevit.
_ hêşta te negûtî ye min ka wî çî ye?!
_ piştî çûye welatî,kesê çu pûte pê nekir.Kesê harî nekir. Hevalên wî yên mezin

bûyn.Neşiya kesê bibînit.Karên wî mane birêve.
Hemû bûne kul û kuvan,liser dilê wî.Yê ketî ye nîva malê wek dîn û hara.
Kes neşên digel baxivit.Her yê diwastyêt her yê ture dibit.Ne dinivit,ne dixot,ne diçite
derê.Gohê xu na dite kesê.
_ ka bide min da digel baxivim.
_ niza ka dê razî bit yan ne?!
_ bêjê Husên,dê razî bit.
_ bila.. Hîviye tû bişêy razî kî!
_ dê razî kim,û dê wî kime mirov!
Telefun bire wê jora dergehê wê lixu girtî û nahêlit kes biçite jor.
_ Hesen..?Dilê min,eve Husên yê liser telefunê.Divêt digel te baxivit?!
navê Husên,wek aveka tezî,leşê wî gezand,hizirên wî geş kirin.Qesta dergehî kir,xu
havête telefunê...
_ helû?
_ ha....?Emê gozê,te xêre?Tû dîsan çûye diçeperî da û bernadî?!
_ Husên...?Çi hale? Biçûk çewanin?
_ bûte bêjim!
_ ê...?!
_ kesê goh lime nîne?!
_ ne... Hema baxive!
_ min biçûk yên hinartîne welatî.Ez bitinê yê limal.Were harî min...
_ harî te...?ً harî te çi bikim?!
_ ma te divêt bikime ser berkê?!
_ dê taze baxive,ez bixu yê bûyme nîve mirov!
_ were, dê bîye mirov û nîv...

_ dê ka bêje,bême çi?
_ were..bişev dûne,û biroj dûne..
_ ma eve tû jiya xu venabî?
_ ma tû jê ve bûy?!
_ ez yê jihemû tişta bûym.
_ ez bawer nakim!
_ bawer bike...
_ pa eve çî ye? Tû yê ketîye xilwê?!
_ ez tureyê biçûkên xu me.
_ malê ne bû biçûkê baş bike,û neyê xirab.
_ ez bû paşeroja xu dikim,eve bihayê wastiyana mine. Kes çu...
_ iha Ma min negût?Tû dest jiya xu bernadî?!
Were,ez dê bihayê wastiyana te livêrê kime nîva destê te!
_ ez her dibêjim,herweku min xebat bû tekirî.
_ ez jî kurê wî welatî me,ewê te xebat bû kirî.
_ bela xu jimin veke.
_ soz bit tû ne êy,ez dûsêyeka bidime bidûyv xu,û bême mala te.
_ ez bawer dikim,tû wê bikî!
_ min gût,soz bit.Ez we bikim.
_ ez dê êm,lê niza biçi hêcet bêm?!
_ hêcet liser min.
_ dê çi hêcet girî?
_ dê digel min kar kî..Ez pêtivî şovêrekî me!
_ tû bela xodêy.
_ tû jî bela serê minî.
_ sobe,heta dosube dê...
_ ne,sipêdê karê xu bike,û were.Ka dayka biçûka bide min,da direweka mezin bû

bikim.Heta izna te bidit.
keniya wî jidil hat.Tijî dêmê jina wî bişkurîn bû.
_ heta sobehî..
_ heta sobehî..
***
_ tû dê çî?
_ divêt ez biçim!
_ lê demê bêhinvedana te ye?!
_ lişoreşê,bêhinvedan nîne!
_ me tû têr ne dîtî!
_ dê çim,da tû têr min bibînî!
_ dê xu dûsê roja gîro bike.
124
_ her demjmêrek geleke.Dujminî karê xu baş yê kirî. Dibêjin dê bihêrişeka berfireh
rabit.
_ xodê digel hewe bit.
_ bibure,min diviya liber tenişta te bim,lê welat fer tire!
_ ez gorî te û welatî bim!
_ heta bêhinvedaneka dî..
_ heta serketineka dî..
Beref wê betena lipişta gondî da rê.Hizar awaz û hîvî di serî da dîlan dikirin.Her çend
pêngaveka,lipişt xu dizifirî, destê xu bû wê bilind dikir!
bilewendiya xu silava wî vedigêra.Rondik jî çava bûn.
Ew pilan û ew hîvyên didilî da kum bûyn.Heta hatina wî, hemû bûne xewn, hêdî hêdî,
berze bûn.

***
Dengê bilindbûya tirênê,jikevlujankê mêranyê îna der.
Dipencera tirênê ra,navê bajêrê hevalê xu Husên dît.
bilez qesta dergehî kir.
Westgeh pire jimirovan.Jiyan dikuka xu daye.
Dinav pêlên mirovada bezebû.Berev senterê bajêrî çû. Liwî cihê jivan hey digel
hevalê xu Husên.rawestiya.
Seruberê wî yê nesaxa ye,çil û karê wî yê gerokaye. Dilê wî yê şêraye! destekî milê wî girt.
Lipişt xu bitirs zifirî.Zanî ev xwîne,neya biyanî ye!Zanî ev seruçave,ne dibiyanî ne!
xudanê destî,xu havête dinav sîngê wî da,û givaşt.
_ tû çewanî kak Hesen?Halê te?Jiyanate?
nezanî dê çi bersiv dit!Nezanî eve kiye?
Çarekadî,çavên wan ketin beramberî êk.Çavzilkanê digel kirin!
_ herweku tû min naniyasî?!
dengê wî diserî da deng vedida.Gehên mejiyê wî har kirin..
***
_ Ez dê çim,tû zêrevanyê bike.
_ ne,ez dê çim û te ageh jimin hebit!
_ bawer bike,ez dê çim.
125
_ bigora şehîda ez dê çim,lê hîviye heker şehîd bûm, leşê min nehêline dinav dujminî
da...
Agir,ji erd û esmana dibart,lihemû rexa top û moşekin.
Liser zikî çû,xu nêzîkî bingehê dujmnî kir.Narinçokek havête dinav koma

zêrevanada.Agir tijî bingehî bû, hemûya pêgve,wek pilan kirî,hêriş kire bingehî.
Karê xu encam dan,zifirîn cihên xw yên berê.
_ destê hewe dixoş bin,karekê serkevtî bû.
_ destên heval lawîn dixoş bin!
_ Kak lawîn?Lawîn..?
_ heval lawîn..?Lawîn? Katû..?!
Dengê nalêna wî jişînwarên dujminî dihat.
_ wesa diyar yê birîndare?!
_ divêt em litana wî biçin!
_ dujminî cih yê girtî!
_ biher rengê hebit.Divêt em jinav destên dujminî rizgar bikin.
_ çu rê naçinê.Em neşên hevala toş bikin.Divêt em dûr kevin!
_ eve ez çûm,tinê pişta min bernedin.
_ raweste,kak Hesen,çu mêranî pênevêt.Dujmin yê har bûy...
_ gohê hewe limin bit.
xu berda dinav wan tiraş û dar û bera da.Libin agirbarana top û moşekan.Heta
gehştiye ser kelexê nîv mirî..
_ lawîn...?Lawîn..? Tû yê saxî?
_ erê...Birîna min dijware.Ez neşêm xu liser piya bigirim.
_ ne tirse,were pişta min,xu bimilên minve bigire.
Lê hişiyar be.Dujmin yê nêzîke...
_ ez neşêm çu berevanyê bikim.
_ tinê xu liser pişta min bigire,heta em bigehine hevala.
diniya têkda agire,dujmin yê bûye gorgekê har,leqa liçiya didit.Ew betena hinda asê û

bilind,da bersîngê xu. Ew kelexê nîv mirî,biçekên xuve liser piştê.Liserê petenê, dû
heval hatine pêşiya wan.Libin berekî bêhna xu vedan.
_ her bijî,te serê me bilind kir.
_ divêt em dûr kevin,lezê bikin.
_ tû here,gera me ye,em dê hilgirin.
Lipişt xu zifirî,gelî tijî agire.
***
126
Liber sîngê wî rawestiya..
_ çiye..?Wesa diyare te ez ne niyasîm?
Ez pîr bûyme?Yan tû?!
_ belê,min tû niyasî kak lawîn!Tû çewanî?Başî?
_ erê,kak Hesen.Ez başim.Sopas.Lê tû vêrê?!Vêrê û tû?!
_ diniyaye..Pêlek bime ket,em livêrê kirine der.Û tû?Tû çewa hatîye vara?!
_ eve hosa bisanahî na ête gûtin!Divêt te mêvan kim. Da em bidilê xu hemû sohbeta
bikin.Ez gelek yê jite xerîb bûyim.
_ bibure,ez mêvanê hevalekî me.Nihu yê lihîviya min.
_ ez te bisanahî bernadim.Ez liesmana lite digerim,nihu tû liber destên minî...
_ ez nizanim ka dê şêm te bînim yan ne?!
_ divêt her te bibînim,da wê qenciya te liser xu sist kim.
_ qenciya çi?!
_ te jibîr kiriye?Te giyanê min yê jinav destên dujmina rizgarkirî.
_ ew ne qencî bû.Ew erkê min bû!
_ liser hindê ra,ez te hosa bisanahî bernadim!

_ carê da hevalê min bêt!Ka wî çi libere?!Kadê me dem hebit?!
_ eve jimara telefuna mine.Ez lihîviya dengê teme.Gîro nebe!
_ dê hemû hewla dim,em pêkve rûnin.
_ heta hevalê te bêt,bû min baxive.Behsê xu bike. Rewşa te çewaye?Jin û biçûk
tehene?Mal û halên te likîvene?Çewa dijî?Hizar hizar pirsiyar min yên heyn?!
_ hê... Hê.Sohbeta min ya kûr û dûre!Dê serête lê bite êş.Hema jê bigere.Tû behsê xu
bike.Te jin û biçûk hene? Tû çewa dijî?
_ erê,min kiçeka ros ya mar kirî.Û min dû biçûk yên heyin.
_ tû çewa dijiyana xuda yê serketî?!
_ kes jijiyana xu yê razî nîne.Em hemû yên hilawîstî ne. Em yên lihîviya mirinê!
_ te ne libere bizifirî?
_ ew hîviya me hemûyane.Lê paşeroj ya berzeye.Yan tû we nabêjî?!
_ dibit.. Jibû ewên wek me,em jiherdû laya bûn.
_ raste,em jidêr û mizgevta bûn.Em neşên wek van bijîn. Û em neşên bizifirin..
_ erê. Mirin bila bixêr bêt.
_ diyare tûjî wek min gelek yê wastiyay?!
keniya çend tolaza,sohbeta wan verevand.
_ diniya bû wan pîroz bit.
_ welat,welatê wane.Çu jê kêm nîne.
_ ax... Welat!
_ erê hizar cara... Ax welat...
127
_ 16 _

_ bibure mamusta,ez jidîtin û sohbeta te têrnabim.Lê min divêt bêjim,matû naçiye
malaxu?Pirsiyara jin û biçûkên xu nakî?Wesa diyare tû yê jimal silî?!
_ nene,ez yê jihemû tişta hatîme şûştin.Kes silbûnê jî digel min nakit.
_ we nîne! Hêşta tû yê liser xu û gencî!
_ min çu pê çê nabit bû mala xu bikim.
_ dîtina te bû wan geleke.
_ biçûkên min yên mezin bûyn.Êdî ageh jimin nîne.
_ û dayka wan?!
_ dayka wan xatûne.Kiça dayk û Babane.Heker ew neba,ez da har û dîn bim!
_ hema jiber xatira wê,bizifire nav biçûkên xu.Da sebra wê jî bite bêt.Em yên
lixerîbiya.
_ sebra kesê bimin naêt.
_ nene,wene bêje.Heker ez te çend,rojeka nebînim.Dê lite germ.
_ malate ava.Tinê tû yê bû min livê diniyayê may.
_ lê bûre,min hindekên dî yên heyn,divêt ez bû wan bim...
***
_ helû?
_ belê keremke?
_ Mamusta limale?
_ nexêr,limal nîne.
_ dê kengî êt?
_ ez nizanim,demên wî ne didiyarin.
_ diyare yê çûye welatî?
_ nexêr, yê...
_ hîvî ye,heker hat silava lê bike.

***

_ dadê ka babê me?

_ babê hewe yê çûye nik hevalekê xu.

_ ma na ête mal?

_ dê êt, lê heta bêt.

128

_ eve demekê dirêje jimal çûy.

_ te çi jê divêt?

_ Mamusta min divêt wî bibînit.

_ ez dê êm ka wê çi divêt?!

_ lê min diviya babû bêt!

_ min jî divêt bêt... Lê...?!

***

Çi aqilê te jivê şevê birî?!

_ bihizar şeva bû.

_ dê şevên hosa her hebin.

_ Ma me çi maye jivan şeva pêve?!

_ şevekadî liser te ye.Xu jiber ne havêje!

_ bawer bike,berûka min weku nîva destê te ye..

_ madê bûte hosa heta kengî çite serî?

_ liser min binivêsin.

_ eve saleke em dinivêsin. Te ya xu ker kirî !

_ dê hemûya liser êk dim.Û sala bêt liser milên mine.

_ keru nemire bihare,heta şîn bit qîvare,heta likerî bû bihar,kuriya kerî bû dar...

_ nene,ez nahêlim kuriya hewe bibite dar.Dê van roja zifirme mal.Ka çi lêk daye.Dê bû
hewe înim.Hêşta kuriya heweya nerm.

***
_ bira,hevalên me xu pê badan.Herkesê zifirî,kirine tiştek.Pare û parçên erdî,û
turmbêl.Em livara çi dikin?!
_ ez xudan biçûkim,ez neşêm jixwandingehên wan bikim,û ez neşêm bitinê jî
bizifirim.
_ pa gazinda neke.
_ hinde,min biriyar da,hemû tişta jibîr bikim.
Welat,kes û kar,xebat.Her tiştê destê min negehitê.Dê livêrê jîm û dê livêrê mirim.
_ em çucar neşên wek van bijîn.
_ em neşên bizifirin jî.Em dê wek xu jîn.
_ em dê mînine hilawîstî.
_ jiyana me hemyê,em dihilawîstî ne.Em yên lihîviya firiyê gay.
129
_ erê..Lihîviya mirinê.
***
_ kurê min,ev kaxeze ya çî ye?Jikîve hatî ye?
_ eve kaxeza daêra karî ye!Bû babê min ya hatî.
_ ê..? Ka bixwîne.Çi gûtîne?!
_ dibêjin,me harîkariya te biriye.Jiber tû liwî jivanê me bû te diyar kirî amadene bûy.Û
eve çend kar me bûte dîtin, tû nakî...
_ iha ew ya jime kêm bû!Harîkariya wî jî hate birîn.Em dê çewa jîn?!
_ dadê?Tû bû telefuna wî nakî,bila bizifirte mal?
_ eve hizar cara min telefuna wî kir.Hingê dizifirt,demê dimînte bê pare.
_ dadê.Ya jiminve,babê min gelek zîrek û baş bû!

_ erê kurê min,babê te hindî tû bêjî hind yê baş û zîreke. Ev welate mêr û zîreka
naniyast.Tinê wan xudan ezman û nasname divên.
_ bila bizifirt,weku gelek hevalên xu.Wî digût min çend sala xizmeta welatê xu kiriye.
_ raste,lê nevêt min bihêlte bitinê.
_ em her bitinê ne,ma kengî digel me dijît?!
_ na wila digel me najît.Ma çi bikim?!
_ hindek cara ez şerm dikim.Hevalên min pirsiyara wî dikin.Behsê wî dikin.
_ çi dibêjin?!
_ dibêjin... Dibêjin...!
_ bêje? Ka ci dibêjne babê te?Bawerneke ha!
_ dibêjin karê wî yê bûye rava jinkên ciwan...
serê xu çemand,çavên wê yên reş,tijî rondik bûn.
_ bawerneke,babê te ji wê çendê mazintire.
Dayka xu bû rondika hêla û qesta jora xu kir.
Zanî axivtinên wî,jibirînên dayka wî yên kûr girtin.
***
_ helû? Tû likîvey?
_ ez yê lipirag.Te çi divêt?
130
_ min tû divêy.Biçûkên te tû divêy.Daêra karî harîkariya te ya birî.Were,bizifire,çi jite
kême?Tû liçi digerî?!
_ ez yê lixu digerim.Ez yê berzeme.Her demê min xu dît, ez dê zifirim!
***
_ 17 _

Dîwana wî,piç piçe ya vala dibit.Ew rû germiya rojên pêşyê nema.Sifira wî,roj bû
rojê,ya hejar dibit. Mêvanên wî,tinê hindek jinên birsî yên mayn!
ew jî kitkite yên pirsiyara xoşmêrekê dî dikin.
_ eve ez çûm.
_ dê kîve çî?
_ dê pirsiyara jiyana xu kim.Tû neşêy nanî bidîye min!
_ raweste,dê bû min pare ên.
_ eve deh roje tû we dibêjî!
_ dê her ên,mala min,nahêlin ez jibirsa bimirim!
_ her demê hatin,tû baş cihê min dizanî...
_ neçe...Min nehêle bitinê...
dengê girtina wê jora bê seruber.Hemû livîn bidawî înan.
Kete beramberî giyanê xu mejiyê xu,û wijdana xu.
Xu kire dadwer û tawanbar.Pirsiyar jixu kirin.Bersiv dan.
Liegera geriya.Dîdevan kom kirin.Hemû pelgew destkevt.Bidijî wî bûn.
zanî ew gonehbarê serekiye.Ma lihîviya biriyarekê.
Dikluxkê mejyê wî da.
çend dadwerek dikom bûn.Mijûlî derkirina biriyarekê bûn.
_ were mal,em yên jite xerîb bûyn.
_ biçûkên te pirsiyara te dikin.Daêre.Polîs..Heval..Dayk û babên te.
eve hemû bû wî ne dibûne kul û xem û ne dişiyan wan dadwera jimejiyê wî dûr
bikin.Çu kartêkirin liser hestê wî nedikir.
Tinê livan rojên dawyê,tinê van gûtinên dawyê,tinê wê hîviya vê carê.Kire êxsîrekê bê
desthelat.
_ were mal, kiça tû çû...

_ were bizifire,kurê te na ête mal...
_ were,em dê berze bin.Were me jivê zifirokê bîne der.Em pêtivî tene...
xu kire serokê dadwera.Xu kire dadwerekê bê dil.
_ sizayê wî mirovê bibite egerê wêrangirina mala xu, berzekirina
biçûkên xu çî ye?!
131
_ ev tawane,jikuştina kesekî mezintire.Eve kuştina gelek
kesane.Windabûna gelek
biçûkane.Kavlkirina binemaleka serbilind û xudan şiyane.
_ siza yê wî çî ye?!Tû bixu biriyarê bide.
_ ma dê çi ji ewa ez têda zêdetir ête serê min?!
_ ma çi jite kême?Tû yê bûye ribîte!Dixoy û vedixoy,her cihê te bivêt
diçyê!Çend
parên biçûkên te kum dikin, tû lizik û bin zikên xu didî....!
lidûr xu zifirî,kes nedît,diviya hindek avê berdite gewriya xu ya hişik.Çu
av nedît.Gazî
jina xu kir.
Kesê bersiv neda,gazî kur û kiçên xu kir.Kes litana wî nehat.
Gewriya wî hişik bû.Xwîna dilê wî,lez kir.Jor teng bû.
diviya xu bigehînte,cihê av lê.neşiya xu liserpiya bigirt. Dişerenîxa giyanê
wî,û
gewriya hişik û xwîna dijwara dilê wî.
Dergeh vebû.Bejna tulazekê sinêle,digel hevalê wî Husên.Hildane jor.
_ eve teç lixukiriye?Tû liçi digerî?Te xêre?!Mane bese? Nê kurê te yê
hindî te lê hatî!
serê xu bilind kire navçavên kurê xu.Neşiya bersiva bişkurîna wî
bidit.Serê xu şor

kir,çavên xu jidil neqandin. Jihemû dilê xu diviya erd bikelişt,û kelexê wî yê mirar
dinav keliştêt xuda berze bikit.
Milên wî girtin,danane ser wî cihê bê seruber.
Zanîn yê jibirs û têhina hişik bûy.
Diviya berê xu bidite navçavên kurê xu.Diviya çavên xu bi mwyên simbêlên wî kil
dit.Diviya bikite dinav sîngê xuda.Sîngê wî yê tijî kul û pîsatî bû.Diviya bikite hewar,
diviya daxwaza mirinê bikit.
Çu jê nehat.Mirin livan çirka bipare naête kirîn.
***
_ heker min kurek hebû,dê navê wî kime zêrek.
Da weku babê xu zîrek bit..
_ pa heker kiç bû?
_ dê navê wê bûte hêlim.
_ erê...Da bikime şirîn..Hingivîn..Da bikime gol û nesirîn û...
_ hêdî hêdî,madê çend nava daniye ser?
_ çend xeslet litene?Dê hind nava danime ser.
_ pirsiyara min?Dê heta kengî te ez hosa vêm?Erê jiber bûkaniya mine?Yan birastî
ew xeslet min hene?!
_ pirsiyareka çivêle.Heker bimin bit,piştî mirinê jî,dê te digel xu bime biheştê,da
pêgve bijîn.Min çi hurî nevên, tinê min huriya xu divêt!
132
dengê hevalê wî,jiwê hizra şirîn îna ser wê rastiya tal.
_ hilû, karê xu bike,da biçine mal.

_ mal...?!Mala çi?Min çu mal nînin!
kurê wî destê xu dana ser milî.
_ malate!Em hemû yên lihîviya te.
serê xu bilind kir,navçavên kurê wî tijî hîvî û jiyanin!
_ me biriyar ya day,em pêkve bizivirine welatî,welatê me,ew welatê te gelek xu bû
wastandî...
_ welat...?!Min çu bû welatî nekirîye.
_ te gelek ya kirî,kes neşên wê jibîrbikit.
_ herkesê dû tiveng bû welatî havêtine dujminekî,divêt welatî bû xu bifiroşt û bidite
binanekê.
_ te gelek ya kirî,tû gelek yê wastiyay.
_ her tiştê mirov bikit bû welatî,kême.Şehîd bûn bû welatî kême!
_ eve ne demê van sohbetane.Em yên lihîviya te.Kurê te xwandin ya hey,direnge!
kurê wî destê wî girt û maçî kir.Bidestê dî bilind kir.
Rast rabû serxu,diviya kurê xu dinav sîngê xu da bişidînit. Diviya karê xu bikit,da
digel wan bizifirte mal!
Neşiya xu liserpiya bigirt,lidur xu zifirî,kes nedît,lipişt xu zifirî,kes nedît.Kire
hewar,kes litana wî nehat.
Gazî kurê xu kir,gazî kiça xu kir,gazî hevalê xu kir,gazî jina xukir.Gazî wê jina berî
çend demjmêra dikuşawî da xwîna wî dimêt kir,kesê bersiv neda...!
Zanî gûtin û hîvyên jina wî dirast bûn.
_ were mal...

_ were.. Kurê te nediyar....
_ were.. Kiçate çû...
_ were mal...
-- Bizifire...
18_4_ 2006 nûrnbêrg
133
**

ŞEVÊN SPÎ

Dostoyevskî
Werger: Firat Cewerî
NUDEM
Weşanên NÛDEM: 1
Şevên Spî
Çapa Yekem 1993
© Weşanên Nûdem
Pergala berg û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê: P. A. Renoir, 1875
ISBN: 91-88592-00-6
DOSTOYEVSKI
(1821-1881)
Fyodor Dostoyevskî di sala 1821 'ê de li Moskovayê tê dinyayê. Diya wî di salên xwe yên ciwan de wefat dike, bavê wî yê doktor, çikûs, zalim û dijwar jî di sala 1839'an de tê kuştin.
Zaroktiya Dostoyevskî li Moskovayê derbas dibe. Ew di 12 saliya xwe de dikeve dibistaneke rastîn. Lê di dema xwe ya dibistanê de gurekî xwendinê ye. Bi şev û roj dixwîne, ji ber xwendina xwe ya pir wext nabîne ku li dibistanê ji xwe re heval û hogiran çêbike. Hevalên wî yên herî baş pirtûkên wî ne. Ev yeka han heya mirina wî dom

dike. Ew xwendina wî ya zêde dinya wî fireh dike, êdî bi awirekî din li der û dora xwe dinihêre, tiştên ku her kes nabîne, ew dibîne û ev yeka han wî di salên wî yên biçûk de dajo ser nivîskariyê.
Dostoyevskî di sala 1845'an de romana xwe ya pêşî bi navê Mirovên Reben dinivîsîne. Ew romana wî ji aliyê rexnegirên wê demê ve baş tê pesinandin. Di sala 1846'an de romana wî Bercêwîderdikeve.
Paşê li dû hev Bermalî (1847) Mîrza Prochartjin (1846) Dizê Rastgo Niyetoçka Nezvanova (1849), Qehremanekî Biçûk (1849, lê di 1857'an de derket) û ev romana di destên we de, Şevên Spî (1848)
Lê di sala 1949'an de Dostoyevskî ji nişka ve ji aliyê leşkerên Çar ve tê girtin. Dostoyevskî zêde li hember girtina xwe dernakeve, lê tenê meraq dike bê ew ji bo çi hatiye girtin. Paşê tê gotin ku sedema girtina wî ew bû ku wî di civînekê de nameyên Belînskî yên qedexe ku ji Gogol re şandibûn, xwendiye. Gava piştî girtina îfadeyên wan, rojekê dibihîzin ku ew ê ji bo wî sûcî bêne gulebaranakirin, Dostoyevskî ecêbmayî dimîne û ji yê li kêleka xwe re dibêje: "Ma gelo bi rastî sûcê me ewçend giran e, ku divê em ji bo wê bêne gulebarankirin?"
Hîn wilo xeberek ji aliyê Çar ve tê şandin, ku dev ji îdama wan berdin. Lê ew berê Dostoyevskî didin Sîbîryayê, wî davêjin nava girtiyên mêrkuj, diz, narkoman û gelek tade û neheqiyan digihîninê.
Lê tiştê ecêb ew e, ku Dostoyevskî li wir ji mirovan bi dûr nakeve, gir û nefreta wî li hemberî mirovan çênabe, lê belê hezkirineke bêdawî ya mirovantiyê di dilê wî de çêdibe. Heta ew li hemberî Çarê ku ew mecbûrî wê jiyana zehmet kiribû jî, bi rehim dibe û evîna gelê Rûsyayê di dilê wî de pêl dide. Ev evîn û hezkirina wî ya li hembeiî rûsan ewqas xurt dibe ku, ew carinan mîna şovenîstekî difikire.
Ew çend salên dirêj yên surgunê, çi bigire navê Dostoyevskiyê

mezin li Rûsyayê dide jibîrkirin. Lê belê piştî ku ew tê berdan, ew bi tûrikê xwe yê tijî ruhuyetên kûr yên mirovatiyê, dîsan derdikeve pêş. Ew bêî rawestan û li dû hev romanên mîna Xewna Apo (1859), Gundê Stepançîkova û Şêniyên wê (1859), Qumarbaz (1866), Gêjik (1869), Sûc û Ceza (1866), Birayên Karamazov (1880) û gelek roman û nivîsarên din dinivîsîne. Ew Dostoyevskiyê ku hatibû jibîrkirin, dîsan li seranserî Rûsyayê navê wî tê bihîstin, dibe yek ji nivîskarên dema xwe û dema me yê herî mezin.
Lê Dostoyevskî mîna hin nivîskarên din yên dema xwe berhemên xwe ne di xweşiyê de dinivîsîne, ew berhemên xwe li surgunê, di feqîrî, perîşanî û belengaziyê de nivîsandine. Ew mirovekî nexweş, bi êş û azar bû. Ji ber vê yekê ye ku cîhana Dostoyevskî tije mirovên nexweş û reben in. . . Ew jî carna yek ji wan e, carna jî psîkoanalîfîkek e, dadikeve kûraniya ruhiyeta wan, cîhana wan ya zaroktiyê tev dide, li sedemên derd û problemên wan digere.
Çavkaniya Dostoyevskî m\io\aû ye. Loma wî heta niha navê xwe parastiye, pirtûkên wî heta niha aktuel in, navê wî gerdûnî ye. Armanca weşanxaneya me ew e ku bi wergerandin û weşandina vê berhema Dostoyevskî, zimanê kurdî bike xwediyê berhemeke nemir û pirtûkeke din li pirtûkxaneya kurdî yajar zêde bike. Em hêvîdar in ku me ê karekî bi dilê we kiribe. . .
F. Cewerî
Şeva Pêşî
Qet nebe, ji bo kurtedemekê be jî, ma gelo
ji bo ku ew nêzîkî dilê te be hatiye afirandin?
IvanTurgenyev
Xwendevanê min yê delal, ew şeveke wilo xweş bû, ku
mirov ancax dikare şevên wilo di xortaniya xwe de

bibîne! Mirov li asmanê rohnî, li stêrkên bi şewq dinihêre û ji xwe re difikire, ku "di bin asmanekî wilo de mirov çawan dikarin hêrs bibin û biqeherin". Lê ev fikir jî ji bo xortan e, xwendevanê delal, hem jî ji bo xortên pir ciwan... Ez hêvîdar im, wê dilê we jî demeke dirêj ciwan bimîne.

Ji ber ku peyv ji mirovên bêhnteng û zirz vebûye, ne di destê min de ye, ku ez biaqiliya xwe ya wê rojê bi bîr neynim. Destê sibehê, aciziyeke ecêb, bêhntengiyeke mezin dilê min dagirtibû. Di dilê min de hîsek ku her kes dev ji min berdidin û min bi tenê dihêlin, çêbûbû. Bi gotina "herkes" heqê we heye ku hûn bipirsin. Ji ber ku ev nêzîkî heyşt salên min in, ez li Petersburgê dijîm, lê min hê jî ji xwe re nasek peyda nekiriye. Lê ma ez ê çi bikim ji nasan? Ji xwe ez Petersburgê ji serî heta binî nas dikim. Ji ber vê yekê, gava hemû rûniştevanên Petersburgê çûne havîngehên xwe, ez wilo fikirîm, ku wan dev ji min berdan û ez bi tenê hiştim. Gava ez bi tena serê xwe jî mam, tirseke mezin kete dilê min, sê rojan weke dêhnan li min hatibû, ez her li kuçe û kolanên bajêr geriyam. Ez çûm kuçeya Neva, çûm parkê, çûm ber perê behrê, ez bi ku ve çûm jî, ew mirovên ku min di hundurê salekê de li eynî cihî didîtin, min vê carê yek ji wan jî nedît. Ew min nas nakin, lê ez wan hemûyan nas dikim, hem jî ez wan ji nêzîk ve nas dikim. Rûyê hemûyan jî niha li ber çavên min in. Dilşahiya wan dilşahiya min, xemgîniya wan xemgîniya min e. Her rojên Xwedê ez li Fontankayê

pêrgî kaloyekî hûrik dibû. Hema wextî ez bi wî kalokî re bibûma dost. Kalo bi kincên xwe yên spehî û bi rêk û pêk, her tim destê xwe yê çepê li ba dikir û hêdî hêdî di ber xwe de dipeyivî. Di destê kalo yê rastê de jî gopalekî destikzêr û girêk girêkî heye. Mêrik êdî hebûna min ferq dike, her cara ku ew min dibîne, ew dixwaze xwe nêzîkî min bike.

Ez dikarim bi şert bileyizim, gava ew min li Fontankayê nebîne, kêfa wî lê dişikê. Ji ber vê yekê, her cara ku ez û ew pêrgî hevdu tên, ger kêfa me li cih be, em herdu jî dikevin hewayeke ku em ê silavê bidine hev. Wî çendê berê, me du rojan hevdu nedît, roja sisiyan gava em li hevdû rast hatin, tu nemabû ku me herduyan jî destê xwe biavêta şewqên xwe û silav bidaya hevdu. Lê baş bû ku tam di wê demê de hişê me hate serê me û me herduyan jî destê xwe berdan ber xwe û me bi tenê mîna berê li hevdu nihêrî û em di ber hevdu re derbas bûn.

Navbera min û xaniyan jî xweş e. Gava ez ji xwe re digerim, ew yek bi yek bi pencereyên xwe ve derdikevin pêşiya min, li min dinihêrin, hin ji wan jî ji min re dibêjin:" Merheba, tu çawa yî?" Eh, ê min şukur ji Xwedê re ez baş im, di meha gulanê de ew ê qatekî din jî li ser min lê bibe". Hinek ji wan jî "Ê tu çawa yî lo? Ê min ew ê sibehê min tamîr bikin", dibêjin. Hinek jî dibêjin: "Do hindik mabû ez bişewtiyama, ez wilo tirsiyam ku" û hwd... Ez ji hinan ji wan hez dikim, ez hinan ji wan jî ji nêzîk ve nas dikim, yek ji wan wê xwe

havîna pêşiya me nîşanî mîmarekî bide. Gava ew tamîr bibe, Xwedê wî bisitirîne, ji bo tiştek bi serê wî de neyê, ez ê her roj herim wir. Hela ez çîroka xaniyekî xwe ê pembe qet ji bîr nakim.

Ew xaniyekî kevirî, biçûk, delal û xweşik bû; gava wî li cîranên xwe yên hepelorî dinihêrî, xwe dinepixand, lê gava li min dinihêrî, rû bi ken bû. Ji ber vê yekê xwîna min jî bi ser wî de dikeliya, ez pê dilgerm dibûm. Gava ez hefteya çûyî di ber wî re derbas bûbûm û min serê xwe bilind kiribû, min dengekî bi şewat " ez bi boyaxa zer boyax kirim" bihîstibû. Û ez çi bibînim, hey haydûtno, barbarno, ne stûn hiştibûn, ne jî banîje... Hemû jî bi rengekî zpîzer boyax kiribûn. Ez hêrs bûm, xwîna min kişiya mêjiyê min. Ji ber ku wan dostê min yê belengaz di rengê împeratoriya Çînê de boyax kiribûn û ew kirêt kiribûn; ew roj ev roj e ez naçim wê taxê.

Erê, xwendevanê min, tu dibînî bê ez çiqasî Petersburgê nas dikim.

Ji bo derxistina sedema wê min li jor behsa aciziya ku ev sê roj in hundurê min perçe kiriye, kir. Ez li kuçê aciz dibûm. "Ev tune, ew tune, ê din kî dizane bê çûye kîjan dqjehê" min digot û min di hundurê xwe de xwe dixwar. Tam du şevan li ser hev, "ma çiyê min kêm e, ji bo çi ez li vir rehet nakim?" min digot û ez dikirî di odeya xwe de dêhn bibûma. Min bi awayekî ecêbmayî li dîwarê rengkesk, yên ku ji hundur ve reş bûbûn û li tevnepîrikên ku bi jêhatîbûna Matiryonayê di zikê

xênî de hatibûn çêkirin, nihêrî. Min got: "Ma gelo hemû aciziya min ji van e?" û min ew kursiyên wir jî di ber çav re derbas kirin.
(Ji ber ku te divê bila bi tenê kursiyek be jî, bê min êvarî ew çawan hiştibe, ez wilo nebînim, ez hêrs dibim). Min çavên xwe li pencereyê gerandin; lê hemû jî vala... Min qet nikarîbû bêhna xwe berda û xwe rehet bikira. Heta min bangî Matriyonayê kir, ji bo tevnepîrik û bêkêriya wê bêî ku ez zêde dilê wê bihêlim, min erza wê şikand. Piştî ku jinikê bi ecêbmayî li min nihêrî, derket û çû. Tevnepîrik hê jî spîsax li cihên xwe sekinî ne.
Dawî dawî, wê sibehê min rastiya çîrokê fêhm kir.
Ya rastî her kesî dev ji min berdidan û diçûn havîngehên xwe. (Li min bibûrin ku ez li vir uslûbeke sivik bi kar tînim, ji ber ku niha ne wextê uslûba bilind e). Ji ber ku hemû rûniştevanên Petersburgê an çûbûn havîngehên xwe, an jî li ser rê bûn û diçûnê. Her kesên ku ez pêrgî wan dibûm, xwe dinepixandin, diketin hewayeke ecêb û digotin: " Em hema seriyekî hatine vir, lê piştî du saetên din em ê vegerin havîngehê". Ger keçikek xweşik, bi tilîkên xwe yên mîna berfê spî li pencerê bikira teqeteq û ji gulfiroşekê gurzek gul bikiriya, ew ne ji bo ku bêhna gulan û buharê têxe xaniyên bajêr yên bêhilm; lê ez difikirim, ku ew ê wan gulan jî bi xwe re bibin havîngehan. Ez bi vê jî nedihatim ser, lê bi vê dîtina xwe ya nuh min tiştên qenc bi dest xistin. Di awira pêşî de min fêhm

dikir, bê ew di çi celeb havîngehan de diman. Yên ku li taxa Kemannî, giravên Aptekarskî, an jî li kolana Peterhovê diman, bi tenikî, bi kincên xwe yên sivik, bi otomobîlên xwe yên spehî li ber çavên min diketin. Yên ku li Pargolovoyê û hîn jî jê wêdetir diman, bi awira pêşî, ew bi mirov mîna kesên biaqil dixuyan. Yên ku ji bo derbaskirina havîna xwe dihatin girava Krestovskiyê jî bi kêf û bi tevgerên xwe balkêş bûn. Bi alavên malê yên wek çiyan, bi maseyan, bi dîwan û gelek hûr mûrên din ve, di ser wan de jî, piraniya caran jinên navmalî yên ji hevdeketî, li erebeyên bi bar, yên li dû hev siwar dibûn û ew firaxên maldarên xwe mîna bîbikên çavên xwe diparastin. Ger ez qeyikeke bi bar, di Neva re, ku heya girava diçe, bibînim, ew li ber çavên min pir dibin. Bi min wilo dihat ku her kes rabûne pê, dû re ketine tevgerê û bi koçmalî ber bi havîngehan ve diçin. Mirov digot qey wê hemû Petersburg vala bibe û di şûna wê de çoleke bêdeng bimîne.
Gava min ew rewş wilo didît, ez bi xwe re hêrs dibûm, min fedî dikir û ez li ber xwe diketim. Yê min ne tu havîngeha min hebû, ne jî ji bo ku ez biçûma cihekî wilo tu sedem hebû. Hûn ya rastî bixwazin, ji bo ku ez bi her erebeyeke bi bar û bi her maldarekî ku faytonek kirê dikir re biçûma, min can diavêt.
Lê mixabin, yekî ji wan jî, erê, yekî ji wan jî bangî min nedikir. Te digot qey ez di quncika xwe de hatibûm jibîrkirin. Bi rastî jî ez ji bo her kesî biyanî bûm.

Ev e, ji ber vê yekê ez wilo pir geriyam. Dawî, weke her car min xwe ji bîr kir, bê ez li ku me û hew min lê nihêrî, ez li ber dergehê derveyî bajêr im. Di wê demê de kêfekê di dilê min de pêl da, ez bi gavên xurt meşiyam û derbasî derveyî bajêr bûm. Ez ber bi erdê çandî û mêrgan ve çûm. Êdî min tu westandin hîs nedikir û mîna ku barekî giran ji ser milê min rabûbe, ez sivik bûbûm. Rûyên kesên ku di ber min re diçûn û dihatin, bi ken bûn, hema hema wextî wan xwe daqûl bikirana û silav bidana min. Her kes bi tiştekî dilşa dibûn û puf pufa wan bûn cigarên xwe dikişandin. Ez jî pir bi kêf bûm. Ez heya niha wilo kêfxweş nebûbûm. Ji nişka ve mîna ez li îtalyayê bim û mîna bajariyekî bi nîvruhê nexweş di nav komên keviran de gêjbûyî, min bi heyranî li mêrgan temaşe dikir.

Bi hatina buharê re, ew diyariya ku ji aliyê Xwedê ve tê û pê hemû cih û deverên mêrgên Petersburgê xweş dibin û dixemilin, tiştin tesîrê li mirov dikin, lê mirov bi xwe bi wan tiştan nahese. Mêrgên Petersburgê carinan jê mîna keçikeke jar û nexweş, carinan jîji nişka ve dibe mîna keçikeke ciwan û bêhawe xweşik. Helbet hûn li hemberî vê keçikê ecêbmayî mane û we xwe winda kiriye.

Bêî ku di destê we de be, hûn dibêjin: "Kîjan hêzê ronahî daye wan çavên ûfbûyî û bifikir? Kê ev hînbûyên daye xetên nerm yên vî rûyî? Ev sîngên nû ji bo çi evqasî hildikşin û dadikevin? Ya ku bi carekê ve şêrîntiyê, spehîtiyê, jîndariyê dide vê keçika rûçilmisî

çi ye? Kê ev ken daniye ser rûyê wê? Ev kenê jîndar yê bi pîqe pîq kê daye vê keçikê?" hûn ê ji xwe bipirsin. Hûn ê çavên xwe, li dora xwe, li hinan bigerînin û hûn ê ji nişka ve fêrî her tiştî bibin. Lê wê ew kurtedem zû derbas bibe. Dibe ku dotira rqjê hûn dîsan eynî wê bi wan awirên melûl, bi rûyê çilmisî, bi tevgerên reben, bi ûfbûyin, bi poşmaniya wê ya jiyana berê, bi belengaziya wê, pêrgî wê bibin. Hûn li vê spehîtiya ku bi carekê ve tê û diçe, difikirin û ev yeka han dilê we disoje. Ji ber ku berî hûn bigihîjin ji vê spehîtiya xapînok û bê kêr hez bikin, ew bi niyeta ku hew vegere, winda dibe.

1 0

Hûn gelekî li ber dikevin û ji ber wê dil û cegerên we dişewitin. . .

Şeva wê rojê ji rqja wê xweştir derbas bû. Ez ji çolê gelekî dereng vegeriyabûm bajêr, saet li dor dehan min nêzîkî li mal kiribû. Riya mala min di ber çem re derbas dibû.

Di vê saeta dereng de, li vir cin û pîrhebok bi gogê dileyizin. Ez çi derewan bikim, ez li taxeke dûrî bajêr rûdinim. Gava ez dimeşiyam jî min ji xwe re stranek digot.

Her gava ez dilşa bim, ez wilo ji xwe re stranekê dibêjim. Her kesên bê dost û heval, gava dilşa bin û nikaribin dilşabûna xwe bi hinin din re par ve bikin, ma ne wilo dikin?

Ji nişka ve tiştekî ku ez qet ne li bendî bûm, derkete pêşberî min. Jinekê xwe li ser pirê spartibû hesinê

pirê. Wê enîşkên xwe danîbûn ser hesinê pirê û li ava
çem ya girikî temaşe dikir. Mantoyekî reş mîna yê xanimqehpikan
lê bû û şewqeyekî xweşik jî li serî bû.
Min di dilê xwe de got: " Ji sedî sed ew keçik esmer e".
Wê dengê teperepa lingên min nebihîstibû. Digel ku
min bêhna xwe girtibû û gumguma dilê min bû jî, dîsan
wê li min nenihêrî. Berî ku ez bibêjim "ecêb, ew çiqas li
avê xayiz bûye" dengê îskîna giriyê wê hate min û ez di
cihê xwe de sar mam. Erê ez ne şaş bûm, keçik digiriya.
Ew her bi îskîn digiriya. Mîna tu bizoteke agir deyne
ser dilê min, dilê min bi wê şewitî. Min got:" Ooy
Xwedêyo!" ez herçiqas li hemberî jinan bi tirs bûm jî,
lê ev yeka han rewşeke pir cihê bû. Hema ez nêzîkî wê
bûm da ku bibêjim " Xanima hêja!" lê hate bîra min, ku
bi hezaran car ev gotin di romanên ku behsa sosyeteya
rûsan ya bilind dike de heye, loma min tişt negot û ez
1 1
bêdeng mam. Di wê navê de ez li gotina ku min ê ji wê re
bigota, digeriyam. Bêhna keçikê jî hebekî fireh dibû,
wê li der û dora xwe mêze kir, serê xwe xiste ber xwe, di
ber min re derbas bû û çû. Hema min jî da dû wê. Ez
bawer im wê dê ew yeka han ferq kiribe, loma ew
derbasî aliyê din yê rê bû. Hûn ya rastî bixwazin, ez qet
nefikirîbûm ku derbasî aliyê din yê rê bibim. Dilê min
ji heyecanê mîna dilê çivîkeke biçûk lêdixist. Lê di wê
navê de bûyerek hate alîkariya min. Li aliyê din ê rê, li
dû jinikê, mêrikekî pak ku frak lê bû, xuya bû. Lê
rêveçûna mêrik qet ne bi rêk û pêk bû; wî carê xwe dispart

dîwêr, dihejiya û bi dû jinikê de dimeşiya. Mîna hemû jinên ku bi şevan ji mêrên nenas yên ku dest diavêjin jinan ditirsin, ew jî bi wê tirsê, wek tîra ji kevên derkeve, ji ber mêrik direviya. Ger şansa min alîkariya min nekira jî, mêrikê serxweş û cangiran, hin herekêtên xurt nekira, ez qet nedigihîştim keçikê. Keçik weke bahozê diçû. Mêrikê ku bi zorê li ser lingên xwe radiwestiya, nedixwest dev ji keçikê berde. Wî nêzîkî li keçikê kiribû, tu nemabû ku bigihiştayê, keçikê kire qîrîn. Xwedê kir gava ez derketibûm, min gopalê xwe yê girêk girêkî bi xwe re biribû. Hew min dît ku ez li ba wan im; wê mêrikê belaxwaz ferq kiribe ku wê çi bête serê wî, loma bêî ku gotinekê jî bibêje, bela xwe ji keçikê vekir û li dû me ma. Piştî ku em hebekî meşiyan, mêrik li dû me gotinin ne xweş û ne li rê gotin, lê em ji hev bi dûr ketibûn, dengê wî baş nedihate me.

Min ji jinikê re got:

- Têkeve milê min, êdî ew nema dikare were aliyê me.

Wê milê xwe yê ku ji tirs û heyecanê diricifî, dirêjî min kir. Hoo mêrikê belaxwaz, min di wê deqîqeyê de

12

ji te re çiqasî dia bikira jî dîsan hindik bû. Min wa hêdî li keçikê mêze kir, min dît ku ew esmereke xweşik e. Nizanim gelo, ne ji ber tirsa berî niha bi kêlîkekê bû, ne jî ji ber liberketina wê ya berê bû, hê jî hêsirên wê li ser lêvên wê belav dibû. Wê jî awirek da min, lê dû re şerm kir û serê xwe bera ber xwe da.

- Te bîstika din guh neda min, te dît bê çi hate serê te? Ger ez bîstika din li ba te bûma, ev tiştên han nedihatin serête
- Lê ez te nas nakim ku. . . Min got belkî tu jî yek ji wan î.
- Baş e, ma tu niha min nas dikî?
- Hindikî... Çîk, tu diricifî, ma ji bo çi?
Digel xweşikbûna keçikê, biaqiliya wê jî kêfa min anîbû.
- Wilo ha, te bi awirê pêşî ferq kiribû? Erê, te niha fêhm kir, bê tu li ba kê yî? Ez li hemberî jinan şermokî me, bi heyecan im û bi qasî tu ji wî peyayî tirsiyayî, ez jî ji jinan ditirsim. Hê jî şerma min neçûye. Tu dibêjî qey ez di xewnekê de me. Ger ez di xewna xwe de jî bibînim ku bi jinekê re dipeyivim, ez ê dîsan bawer nekim.
- Çawa, tu çi dibêjî?...
- Erê, wilo ye. Sedema ricifandina destê min ew e, ku heya niha destekî mîna destê te neketiyê. Ez ji jinan baş bi dûr ketibûm. Tu a rastî bixwazî, ez qet hînî jinan nebûme. Ez peyayekî bi tenê me... Ez nizanim bê mirov çilo bi we, jinan re dipeyive. Ez niha jî nizanim. Hêvîdar im ez niha bi te re mîna ehmaqan napeyivim. Ger wilo be venekişe, bibêje. Metirse, ez ji te naxeyidim...
- Na, ez di peyva te de tu tewşiyan nabînim; bereva-
13
jiya wê, tu gelekî xweş dipeyivî. Tu a rastî bixwazî, jin ji mêrên hebekî şermokî bêtir hez dikin. Ez dixwazim

û destûra te didim, ku tu bi min re werî heya mala min.
Ji kêfan kirî bêhna min biçikiya:
- Tiştê ku tête fêhm kirin tu ê bi vî awayî misqala tirsê bi min re nehêlî. Wê çaxê jî ez ê xêtir ji hemû çareyên xwe bixwazim.
- Çareyên te? Çi çare? A ev yeka han pir xerab e!
- Bibûre, ji devê min derket. Lê, tu ê niha çawa daxwaza tiştekî ku ez naxwazim, bikî?
- Daxwaza ecibandinê?
- Erê, hewl bide min fêhm bike, ka bê ez mirovekî çilo me. Tu nemaye ez têkevim bîst û şeş saliya xwe, lê ez hê jî neketime nava mirovan. Gava rewş wilo be, ez ê çawa bikaribim xweş bipeyivim û gotinên xwe di cih de bi kar bînim.
A baş ew e, mirov her tiştî weke ku heye bibêje. Gava dilê min bipeyive, ez nikarim bêdeng bimînim... Guh mediyê, ne girîng e... Tu bawer dikî ku ez hê bi jinekê re nebûme dost? Erê, ne bi jinekê re jî... Ez her tim xeyala ku ez ê rojekê jinekê nas bikim di serê xwe de çêdikim. Ma tu dizanî bê ez çend caran bi vî awayî dildar bûme?
- Çawa wilo çêdibe, dilê te dikeve kê?
- Dilê min nakeve kesî... Dilê min dikeve wê jina ku di bîra min de ye û rûyê wê yê ku di xeyala min de ye. Ez di xeyalên xwe de romanan diafirînim. Ax, tu min nas nakî! Niha tu dibêjî ger ev jinan nas neke, çênabe, lê tu nizanî bê ez çi celeb jinan nas dikim. Hemû jinên ku ez nas dikim çend kevaniyên malan in. Hem jî ez li hinin wilo rast hatime ku... Ger ez tiştekîji te re bibêjim tu ê

bi min bikenî. Çend caran min dil kir ku ez li kuçê bi
xanimjinekê re bipeyivim. Ew peyva min ya bi wê re
14
wê sade, bi şermokî, bi giramgirî û hundursotî bibûya.
Min ê jê re bigota, ez heya niha bi jinekê re jî nebûme
heval. Ji ber vê yekê jî min ê jê rica bikira, ku gava ez
pê re dipeyivim, ew min neqewirîne. Û min ê jê re
bigota, bi paşdevegerandina xwesteka mirovekî nola
min, bi xatûneke mîna wê nakeve. Wê hemû daxwaza
min ji wê ew bûya, ku ew tenê mîna xwişkekê du
gotinên xweş bi min re bike. Erê, bi tenê du gotinên
xweş... Min ê jî bixwesta ku gava ez devê xwe vekim, ew
min neqewirîne, bi bawerî li gotinên min guhdarî
bike, ger ew bixwaze, ew dikare bi gotinên min bikene
jî. Lê tenê ew bersiva min bide, tenê du gotinan ji min
re bike, bi tenê du gotinan û jê pê ve jî min ê jê re bigota,
êdî em ê hew hevdu bibînin. Binêr, tu dikenî. . .
Ji xwe ez jî ji bo vê yekê ji te re behs dikim...
- Ji min mexeyide, lê ji bo ku tu dijminê xwe yî ez dikenim.
Ger te biceribanda, te ê bikarîbûya li kuçê bi
jinekê re bibûya dost. Jin ji sadebûnê hez dikin. Ger ne
jinin ehmeq bin û ji tiştinan gelekî aciz nebûbin, wê
her jin bixwaze bi kêfxweşî bi te re çend gotinan bipeyive.
Tu dîsan jî guh mede gotinên min. Kî dizane, belkî
ew dikarin bibêjin ku tu dêhn e jî. Min berî niha bi
kêlîkekê ji te re fikra xwe gotibû. Ji ber ku ez bi jiyana
mirovan dizanim, min pir tişt dîtine, pir tişt bi serê
min de hatine. . .

- Oo, gelek spas! Tu dizanî bê te niha ji bo min çi qencî kir...
- Baş e, wê çaxê bibêje, ê min... Ez çilo bibêjim, te ji ku fêhm kir, ku ez keçikeke hêjayî dostaniyê û qîmet im? Ji bo çi te biryar da ku tu nêzîkî min bibî?
- Ji bo çi? Ji ber tu bi tenê bûyî, ew mêrikê ha jî rehet nedisekinî, ew çavsorî bûbû û şev bû. Vê yeka han mîna
15
wezîfeyekê qebûl bike.
- Lê na, berê, li aliyê din yê rê ... Te hê li wir xwestibû tu xwe nêzîkî min bikî, ma ne wilo ye?
- Li wir, li hember? Bi rastî nizanim ez ê çilo bersiv bidim. Ez ditirsim... Ma tu dizanî ku ez îro pir dilşa me. Ez qet nesekinîm, ez her geriyam, min ji xwe re stran gotin. Ez derketim derveyî bajêr, çûme nava erdan. Bi qasî ku ez di van deqîqeyan de dilşa me, ez tu caran dilşa nebûme. Tu... Lê dibe ku ji min re wilo hat... Bibuhure ku ez tînim bîra te, lê weke ku min dengê giriyekî bihîstibû. Heçê ez im... Min debar nekir... Dilê min êşiya... Ay, Xwedêyo! Ma gelo min nêzîkahiyek li hemberî te hîs nekiribe? Gelo min sûcek kir, ku dilê min weke yê birayekî te bi te şewitî be? Bibuhure ku ez dibêjim, dilê min bi te şewitî... Neyse, ji bo ku ne di destê min de bû ku ez nêzîkî te bibim, ma gelo te dilê xwe ji min girt?
Keçika ciwan çavên xwe bera erdê dan û destê min guvaşt.
- Bes e êdî, dev ji van tiştan berde, got. Ji bo ku min

peyv anî ser vê mijarê ez sûcdar im, lê ji ber ku ez di derheqa te de şaş nefikirî me, ez xwe serbilind hîs dikim...
Eh, va ye em gihîştin malê. Ez ê di vir de têkevim vê kuçeya tengik. Mala min li vê nêzîkê ye... Di xweşiyê de bimîne. Spas dikim...
- Ma em ê êdî hew hevdu bibînin? Ma wê her tişt wilo dawî were?
Keçik keniya:
- Tu dibînî, te pêşî du gotin dixwest, tu niha jî... Jê pê ve ez hew tiştekî dibêjim. Dibe ku em careke din jî hevdu bibînin.
16
- Ez ê sibehê werime vir. Bibuhure ku ez vê ji te dixwazim.
- Tu pir bêsebir î. Di ser re jî tu wextî emir biM. . .
Min peyva wê birî:
- Deqîqeyekê raweste, li min bibuhure, dibe ku ez dîsan tiştekî ecêb ji devê xwe birevînim... Tiştê ku ez dixwazim bibêjim ev e, ger ez sibehê neyême vir, ez îdare nakim. Ez xeyalperestek im. Di jiyana min de bûyerên ku dibin wilo hindik in, ku ev deqîqeyên me bi hevdu re derbas kirin, pir kêm bi serê min de tên. Loma ez gelek caran bûyerên wilo di xeyala xwe de didime jiyandin. Ez ê sibehê werime vir. Ez ê te hemû şevê, hefteyekê, salekê xeyal bikim. Ez ê sibehê werime vir. Ez ê sibehê tam di vê saetê de werime vir. Gava ez hevdudîtina me ya îro bi bîr bînim, ez ê xwe dilşa hîs bikim. Du-sê cihên min yên wilo li Petersburgê hene.

Carekê, min rojên xwe yên buhurî bi bîr anîbûn û ez jî
weke te giriyabûm. Kî dizane, dibe ku tu jî berî niha bi
deh deqîqeyan ji ber bîranîneke wilo digiriyayî.... bibuhure,
min dîsan xwe ji bîr kir. Dibe ku jî tu demekê li
vir deqîqene dilşa jiya be.
- Baş e, belkî ez sibehê saet di dehan de werim. Ez çi
bikim, ji destê min nayê ku ez te bişikînim. Divê ez
sibehê li vir bim. Nebe nebe, tu nefikîrî ku min ji bo
hevdudîtinê wext daye te. Hatina vir ji bo şexsê min
pêwîst e. Wê çaxê ez dikarim bibêjim, ku di hatina te de
jî tu nelirêtî tune ye. Dibe ku sibehê jî bûyereke mîna
ya îro nexweş çêbibe, neyse, tu wê hesab meke. . . Xwestina
min ev e; Ji bo ku ez çend gotinan bi te re bipeyivim,
ez dixwazim te bibînim. Lê ez hêvîdar im, tu ê di derheqa
min de tiştekî xerab nefikirî. Vê jî bizanibe, ez wilo
bi her kesî re hevdu nabînim. . . Min bi te re jî wext vene-
17
diqetand, ger... neyse... ez vê sira xwe eşkere nakim!
Tenê şertekî min heye.
Ez bi kêf qîriyam:
- Te got, şertekî te heye! Ez bi hemûyî, bi hemûyî razî
me. Ez amade me ku her tiştên tu bixwazî, bikim. Ez ji
te re soz didim ku ez ê li hemberî te bi hurmet bim, her
tiştê ku tu bixwazî ez ê biktm. . .
Êdî tu min nas nakî.
Keçik dikeniya.
- Ev e, ji ber ku ez te nas nakim, ez ê sibehê te
biezimînim vir. Ez te pir baş nas dikim. Ez dîsan di

bîra te de tînim, tu şertê min ji bîr nekî. Çi dibe, tu niha tiştên ez dixwazim, bike, ez ji dil dibêjim; dil nekeve min. Bawer bike ev ne mumkun e. Lê ez ji dostaniyê re hazir im, va ye destê xwe dirêjî te dikim. Lê hezkirin nabe, qet nabe!

Min bi destê keçikê yê biçûk girt.

- Ez sond dixwim.

- Ne hewce ye ku tu sond bixwî. Ez dizanim tu ê wekî barûdê biteqî. Tu ji bo van gotinên han li qusûra min nenihêre. Ax, ku te bizanîbûya bê ez çiqasî bi tenê me. Ne kesekî min yê ku ez çend gotinan pê re bipeyivim heye, ne jî kesekî ez pê bişêwirim... Ez nikarim li kuçeyan jî ji xwe re li hevalan bigerim. Lê tu cihê yî, tu dibêjî qey ev bîst sal in em hevalên hevdu ne... Tu ê li ser soza xwe bimînî, ne wilo?

- Ma tu ê bimînî? Lê ez ê çawan dawiya vê zirecêba rojê bînim!

- Xweş binive û vê jî bizanibe ku ez baweriya xwe bi te tînim. Şev baş! Kêfa min gelekî ji peyva te ya gava din re hat: Mirov ne hewceye ku hesabê her daxwaza xwe bide.

18

Tu dizanî, gava te ev gotin, ez tavilê têgihîştim ku ez dikarim baweriya xwe bi te bînim...

- Ji kîjan alî ve? Çi dibe, bibêje!

- De, di xweşiyê de bimîne. Bila ev mijar niha veşirtî bimîne. Wilo ji bo te çêtir e, dişibe romanê... Dibe ku ez wê yeka han sibehê bibêjim, dibe ku jî ez eşkere nekim.

Ez pêşî dixwazim bi te re bipeyivim, te baş nas bikim.
- Ez ê sibehê ji te re behsa xwe bikim. Çi ecêb e! Mîna ku ez di hundurê mucîzeyekê de me... Xwedêyo, ez nizanim bê li ku me. Ma gelo ji bo ku te mîna jinên din nekir û ez ji ba xwe neqewirandim, tu ji xwe hêrs dibî?Ji min re rast bibêje! Te ez di du deqîqeyan de kirim mirovekî dilşa. Erê, mirovekî ku heya li dinyayê be, wê dilşa be. Belkî te kir ku ez bi xwe re li hev bêm.Te hemû şikên min rohnî kirin. Demêri min ên wilo çêbûne ku... Guh mediyê, ez ê sibehê ji te re behs bikim. Tu ê sibehê ji min tiştekî nû bibihîzî.
- Baş e, min qebûl e, tu ê berê dest pê bikî.
- Di xweşiyê de bimîne!
- Oxirbe!
Em ji hevdu veqetiyan. Ez hemû şevê geriyam. Min qet nikarîbû biryara çûyina malê bidaya. Ez pir dilşa bûm. Ox, me ê sibehê hevdu bidîta. . .
1 9
Şeva Duyemîn
Keçika ku bi ken herdu destên min guvaştin,
- Ez dibînim te roja xwe nebiriye serî, got.
- Ev du saetên min in, ez li vir im, tu nizanî bê hemû rqjê çi qewimî ye.
- Ez dizanim, ez dizanim...Neyse, em vegerin ser mijara xwe. Ka tê derxe bê ez bi çi armancê hatime vir! Êdî mîna do zimandirêjî tuneye. Ji niha û pê ve divê em aqilê xwe bidin serê xwe. Ez dûr û dirêj li bûyerên do fikirîm.

- Em ê bi çi celebî aqilê xwe bidin serê xwe? Ez bi xwe ji vê yekê re hazir im; lê ez dixwazim vê jî rohnî bikim, ku ez tu caran mîna niha biaqil nebûme.
- Dibe, a yekê ez ji te rîce dikim, tu destê min ewqasî neşidîne. A dudan, ez îro pir li te fikirî me.
-Paşê?
- Paşê jî divê em her tiştî ji nû ve dest pê bikin. Ji ber ku min îro biryar daye ku ez ê te baş nas bikim. Ez li hemberî te mîna keçikeke zarok, bi xamî tevgeriya me. Ez dikarim dawî vê bibêjim, ku sedema van hemûyan tenikiya dilê min e. Wek her tim, gava mirov
20
pirsên xwe çareser dike, mirov xwe dipesinîne, niha jî hemû sûc ji xwepesindayina min e. Ji ber vê yekê, ji bo ku ez bikaribim şaşiya xwe rast bikim, divê ez te pir baş nas bikim. Ez naxwazim di derheqa te de ji kesî din bipirsim. Ez dixwazim tu ji min re behsa xwe bikî. Ez dixwazim tu xwe bi min bidî naskirin. De, fermo behsa xwe bike. Ez dixwazim zû fêrî çîroka jiyana te bibim.
- Çîroka jiyana min? ez bi tirs qîriyam. Kê ji te re got, ku çîrokeke jiyana min heye. Tiştekî min î wilo tune ye...
Keçikê bi ken peyva min birî:
- Ger çîrokeke jiyana te tune be, tu çawan dijî?
- Ma çiyê hêjayî behsê di jiyana min de heye? Ez heta niha bi tenê û ji xwe re jiya me. Erê, bi tenê, bi tikî tenê... Gelo tu dizanî bê "tenêtf çi ye?
- Çawa tenê? Yanî bêî ku tu kesî bibînî, tu jiyayî?

- Na, ne wilo. A dîtinê ez dibînim, lê ez dîsan jî bi tenê me.
- Qey tu dixwazî bibêjî ku tu bi kesî re napeyivî?
- Erê, tiştekî wilo.
- Wê çaxê tu mirovekî çilo yî, de ka behsa xwe bike. Haa, raweste, min fêhm kir, yê te jî mîna min pîrikeke te heye. Pîrika min kor e. Min xwe dîtiye nedîtiye kirasê wê di destê min de ye, ez wextî peyvê jî ji bîr bikim. Min berî niha bi du salan şûmiyek kiribû, loma wê kurtekirasê min bi yê xwe ve derzî kiribû, em hîç nikarîbûn ji hevdu biqetiyana. Ew rûdinişt û wê bi wê korbûna xwe gore çêdikirin. Min jî an dirûn dikir, an jî bi dengê bilind jê re pirtûk dixwend. Ev e, şiklê jiyana min wilo ye. Ev du sal in, kirasê min bi yê wê ve derzîkirî ye û ez li ba wê rûdinêm. . .
- Eman, Xwedê bisitirîne! Çi bêşansiyeke mezin e! Lê
21
ê min pîrikeke min ya wilo nîn e.
- Ger pîrikeke te ya wilo nîn be, wê çaxê tu ji bo çi li malê rûdinê?
- Guh bide min, ma tu dixwazî bibihîzî bê ez zilamekî çilo me?
- Erê, ez dixwazim. . .
- Hem jî bi her awayî?
- Erê, bi her awayî!
- Baş e, wê çaxê ez tîpek im.
Te digot qey ev salek e, keçika ciwan nekeniyabû; ew bi hîke hîk keniya.

- Tîp, çi tîp? Bi Xwedê tu mirov ji ken diteqînî!
Binihêre, wa ye li wir şûneke vala heye, heydê em
herin li wir rûnên. Kes di vir re naçin û nayên, wê
dengê me neçe kesî. De, berî ku dereng bibe tu behsa
çîroka xwe bike! Tu çi dibêjî bibêje, lê tu nikarî bi min
bidî bawer kirin, ku çîrokeke jiyana te nîn e. Tu
tiştinan ji min vedişêrî. Ka tu pêşî behsa "tîp" î ji min
re bike, bê ew çi ye.
Ez jî bi kenê wê yê zaroktî re keniyam.
- Ma te got, tîp. Tîp ew e ku ji her kesî cûda ye û ecêb e.
Hêlên wî yên ku naşibin yên kesî hene. Gelo ma tu bi
maneya xeyalperestiyê dizanî?
- Xeyalperestî? Ez çawan bi maneya wê nizanim! Ez
bi xwe xeyalperest im. Gava ez li ba pîrika xwe
rûdinêm, ma çi nayê bîra min!... Gava ez xeyal dikim,
ez wilo ji xwe diharim, ez carinan bi lawê padîşahê Periyan
re dizewicim. Xeyalkirin carinan jî tiştekî pir
başe.
Rûyê keçikê bi carekê ve ziwa bû:
- Lê ne her tim, got. Ger tiştekî ku mirov lê bifikire
hebe, xeyalkirin xweş e.
22
- Pir baş e! Ger tu xeyala zewaca bi lawê Padîşahê Periyan
re çêdikî, tê wê maneyê ku tu ê wê çaxê min baş
fêhm bikî. Ka raweste, ez hê navê te nizanim.
- Dawî dawî hişê te hate serê te. Ma ne hebekî dereng
e?
- Ax, bibuhure, ez wilo dilşa me, ku nehat bîra min ez

navê te bipirsim.
- Navê min Nastenka ye.
- Bi tenê Nastenka?
- Erê, ma bi te hindik hat, tu jî çi mirovekî birçî yî!
- Ma te got, hindik e? Pir e jî!
Hê te di hevdudîtina me ya pêşî de xwestibû ez ji te re bibêjim, Nastenka, loma ez bawer im, tu keçikeke dilpak î.
- Ez wilo me! Eh, tu behs bike.
- Baş e, Nastenka, ez ê niha ji te re behsa çîroka xwe ya qirdikî bikim.
Ez li ba wê rûniştim, bi cidî, mîna zaneyekî ku ji pirtûkê bixwîne, min dest pê kir û behsa xwe kir:
- Dibe ku tu pê nizanibî Nastenka, li Petersburgê, li taxa ku ez lê rûdinêm, tiştên ecêb hene. Ew roja ku hemû Petersburgê rohnî dike, li wir cihê ye. Tu dibêjî, qey ew roj xusûsî ji bo wir hatiye afirandin, pir guherî ye, dikeve şiklekî din. Wekî din, bi şewqeke taybetî wan deran rohnî dike. Ev e, li xewlecihên wilo jiyan jî guherî ye, xanima hêja, Nastenka! Qet naşibe wê jiyana ku li der û dora te dikele. Ev ji jiyana sergiran ya dema me cuda ye, lê mîna celebekî ku ji çîrokan hatiye bihîstin e. Bi tevliheviyek xeyalên rijî û îdealên germ e. (Mixabin Nastenka, zimanê min nagere, ez bibêjim bêhawe semewq e), ev jiyana ku ez ji te re qal dikim, jiyaneke bêreng, kevin û adî ye.
23
- Xwedêyo, ev çilo destpêk e! Em binêrin, bê hîn çi

bibihîzin?
- Tu ê gelek tiştan bibihîzî, Nastenka. (Bi min wilo dixuye, ku ez ê bi gotina Nastenaka qet newestim). Ev e, li van quncikan tîpemirov û xeyalperest dijîn. Ger em xeyalperestekî baştirîn bidin naskirin, em dikarin jê re bibêjin, benderuhekî bêcinsiyet. Xeyalperest bi piranî li xewlecihan dijîn; li xewlecihên ku hê lingên mirovan pê neketine. Tu dibêjî qey ewji şewqa tavê direvin. Ew mîna şeytanokan xwe dikişînin qulên xwe.
A rastî ew heywanên mîna kûsiyan ku malên xwe bar dikin, tînin bîra mirov. Belkî hûn meraq dikin, bê çima ev zilam ji van çar dîwarên xwe ewqas hez dike? Hem jî dîwarên ji sedî sed bi rengê kesk boyaxkirî, ji dixana cigaran reşbûyî, mekroh û aciziyê dide mirov. . . Ji xwe nas û dostên wî pir hindik in. Gava yek ji wan were seredana wî, ew reş û zer dibe, bi dest û lingên li hev geriyayî pêrgî wî tê. (Dawî dawî, dostên wî hêdî jê bi dûr dikevin). Ew di nava çar dîwaran de dikeve rewşeke mîna ku wî sûcek kiribe. Tu dibêjî qey wî ji kovarekê re nameyeke bê îmze şandiye û bi nameya xwe re jî helbestên xwe şandine, lê di nameyê de daye xuyakirin, ku ew helbest ne yên wî ne, lê yên hevalekî wî ne; hevalê wî mirî ye, wî weşandina helbestên hevalê xwe ji xwe re mîna deynekî zanîbûye. Nastenka, ji bo çi mirovên tîp bi dostên xwe re rûnanên û ji xwe re nakevin sohbeteke xweş û germ? Ji bo çi bi dostên xwe re yê ku bi ketina hundur re kêfa wî lê dişikê, nakene, du gotinên bi heyecan ji dev dernakeve?

An na ger li cihin din be, ew dikene, kêf dike, bi heyecan dipeyive, behsa jinan dike. Di nêzîk de ev dostê ku wê bê naskirin, ew jî çima hê di seredana pêşî

24

de -ji ber ku wê seredana duda çênebe, wê careke din gava xwe neavêje vî hundurî. Ji rûyê mazûbên yê ji hevdeketî ecêbmayî dimîne. Ger ew heneker be. henekên wî di qirika wî de dicemidin û dimînin, xwe şaş dike. Ez vê rewşê azad bikim, peyvên jîndar bikim, ezjêhatîbûnaxwe didim nîşandan û tiştên ku ez di derheqa jinan de dizanim, jê re qal bikim. Ez li hember dostê xwe yê ku riya xwe şaş kiriye û hatiye seredana min; hebekî şên bixuyim". Bi vî awayî ew ê xwe gelekî bide dest. Çi mêvandarî, ji bo sedemeke bêbingeh, mîna ku karekî wî yê gelek girîng derketibe, ew dest diavêje şewqê xwe, bi carekê ve radibe ser lingan; poşmaniya xwe dide nîşandan, ji bo ku ji ber şaşiyên ku kirine ji guvaştina dest rizgar bibe, ew xwe diavêje derve. Ji bo çi gava ev dostê han di derî re gava xwe diavêje der, bi pîrqîn dikene û sond dixwe ku ew ê careke din neçe seredana vî hevalê xwe yê bi rastî qenc, lê ecêb. Ji aliyekî ve jî çima ew şiklê rûyê wî mêrîkê ew berî bi kurtedemekê pê re peyivî bû, digel ku tu têkiliyên wan bi hev re tune ye jî, dişibe rûyê çêlikeke pisîkan ya belengaz, ku lêdan xwariye û mîna wê rebena çêlika ku ji destên zarokên ku tade, lêxistin û eziyet lêkirrine, difilitîne, di tariyê de baz dide bin kursiyekê, êdî di binê kursiyê de heta ku bixwaze wê

pirça xwe gij bike, neynûkên xwe nîşan bide û wê bi (patileriyle)
wî rûyê xwe yê ku ji şerman reng diguherîne,
bişo. Piştî wê jî ew ê demeke dirêj ji xwezayê, ji benderuhan,
heta ew ê ji wê xwarina ku bermalî didiyê jî
nefret bike, bi çavekî dijminahî lê binihêre.
Nastenkaya ku devê wê bostekê vebûbû, çavên wê
beloq bûbûn û bi ecêbmayî li min guhdarî dikir, gava
ez hatim vir, peyva min birrî.
25
- Deqîqeyekê, ez bi sedema van tiştên ku tu ji min re
behs dikî, nizanim. Herweha ez sedema wan pirsên te
yên ecêb ku tu ji min re behs dikî jî nizanim.
Tiştekî ez fêhm bikim hebe jî, ew e ku ev tiştên tu
behs dikin, hemû di serê te de derbas bûne.
Rûyê min bi cidîyeteke xurt ve tijî bûbû:
- Bêşik wilo ye, min got.
- Baş e, wê çaxê tu çîroka xwe bidomîne. Ez pir meraq
dikim, bê wê çîroka te çawa dawî were.
- Nastenka, gelo ma tu dixwazî bizanibî bê gernasê
me, ya rastî, min xwe çawan kişandiye quncikekê û ez
bi xeyalên xwe re çi difikirim? Ma tu dixwazî bizanibî
bê li hember seredana dostekî min, a ji nişka ve çima
serê min tevlihev dibe. Tu dixwazî bibihîzî, bê gava
deriyê min vedibe, ez çawa sor dibim û dest û lingên
min çawa li hev digerin, ji ber ku ez ê nikaribim mêvên
vehewînim, ez bi hîsên mêvanperweriyê dikevim binê
erdê. Bibêje...
- Erê, erê! Tiştê ez dixwazim fêr bibim ev e. Binêr, tu

çîroka xwe gelekî xweş dibêjî, gelo tu nikarî hebekî nexweştir behs bikî. Mirov dibêje qey tu ji pirtûkê dixwînî. . .
Ji bo ku ez nekenim min bi zorê xwe digirt, min bi dengekî berz û serbilind got:
- Nastenka, Nastenkaya delal, ez jî dizanim ku ez xweş behsa çîroka xwe dikim. Lê bibuhure, ez nikarim bi celebekî din behs bikim.
Tu dibêjî qey ez ruhê Hezretî Silêman yê ku hezar salî di binê kûpekî de bi heft mohran devgirtî mabe û paşê mohrên wî vebûbin û azad bûbe, hildigirim. Di dilê min de hîseke wilo heye.
Piştî jiheweqetandineke dirêj, gava ez gihîştim te (
26
Ji ber ku ez te ji mêj ve nas dikim, Nastenka, ji ber ku ez bi salan li yeka mîna te digeriyam. Ewa ku ez lê digeriyam tu bûyî. Pêrgîhevhatina me li eniya me nivîsandiye), di ruhê min de bi carekê ve bi hezaran qapax vebûne û niha ez bi pêla peyvê re xwe vala dikim. An na ez ê bifetisim, Nastenkaya delal. Ji ber vê yekê Nastenka, çi dibe, peyva min nebire, heya dawiyê bi hurmet li min guhdarî bike. Ger tu guhdarî nekî, ez nabêjim, ez ê bêdeng bimînim.
- Baş e, baş e, baş e! Ez careke din peyva te nabirim. Tu qal bike, êdî gotinekjî ji devê min dernakeve.
- Wê çaxê ez ê dewam bikim. Dosta min Nastenka, saeteke rojê heye ku ez gelekî jê hez dikim. Ev saeteke wilo ye ku hemû kes kar, mijûlî û xebatên xwe xelas

dikin. Her kes ji bo bêhna xwe berdin, ji bo ku xwarina
xwe bixwin, ber bi malên xwe ve dilezînîn. Heya ku ew
digihîjin malê, di rê de bi hev re henekan dikin û behsa
ku ew ê çawa êvarê û şevê xweş derbas bikin, dikin. Di
vê saetê de qehremanê me jî - Bi destûra te be Nastenka,
ez ê çîroka xwe bi şexsê sêyemîn bidomînin, ji ber ku
gava ez bi şexsê yekemîn qal dikim, ez şerm dikim - erê
qehremanê me yê ku li gorî wî karekî wî heye, ew jî vê
saetê mîna her kesî li kuçê ye. Hebekî westiyayî ye, ji
rûyê wî yê çilmisî şopa zewqeke seyr dixuye. Ew li vemirandina
şewqên dawî yên asmanê sar, yên Petersburgê,
bi heyecan temaşe dike. Gotina "temaşe dike"
derew e, ya rastî ew van şewqan di hundurê xwe de hîs
dike.
Ji ber ku ew westiyayî ye û mêjiyê wî bi tiştên hê
balkêştir re mijûl e, tu bibêjî nebêjî wextê ku ew ji der û
dora xwe re veqetîne, hindik. Gava ew karekî xwe yê
zehmet xelas dike, mîna zarokekî dibistanê, ku piştî
27
dersên xwe bi çindikavêtinî ji xwe re dileyize, ew wilo
dilşa ye, ji kêfa nikare di cihê xwe de raweste. Tu bala
xwe bidiyê Nastenka, tu ê bibînî ev kêf û şahiya han
sinirên mêrik hişyar dike, jêhatîbûna wî ya xeyalî ku
di dereceya nexweşiyê de ye, dixe tevgerê. Mêrîk xayiz
e, difikire...Ma gelo ew li çi difikire? Gelo ew li şîvê difikire?
Wê çawa şeva xwe derbas bike? Ma tiştekî ku ew
lê dinihêre heye? Gelo ew li silava ku dewlemendek di
hundirê erebeya xwe de, dide xanimjinekê, difikire?...

Na, Nastenka, têkiliyên wî bi tiştên wilo çirtovirto re nîn e. Ew niha bi karê xwe yê jiyanê ve mijûl e; biriqandina çirûskên dawî yên roja ku vedimire, ne bêsedem e. Dilê wî yê ku bi van çirûskan germ dibe, bi hezaran xwestek tê de şiyar dibin, heta tu bixwazî ruhê wî dewlemend dikin. Gava qehremanê me berê bi her awayî riya ku ew tê re diçû nas dikir, niha mîna ku ew rê qet tune ne, "Xwedaya Xeyalê" bi destên xwe yên jêhatî tara zêrînî ya gergefeyê amade dikir. (Nastenkaya hêja, ez bawer im te Jukavsky xwendiye).

Niha jî ew reqsên dinya çîrokên periyan yên dûrî aqilan dike. Kî dizane, dibe ku qehremanê me bi destên Xwedaya Xeyalê yên bi huner girtibe û heft qatan ber bi asmana ve bilind bûbe. Ew di riyên meşê yên kevirî de diçe malê. Tu dixwazî wî rawestînî, jê bipirsî bê ew li ku ye, ew bi ku ve diçe. Ew ê nikaribe bersiva ku ew li ku ye, an jî ew ê bi ku ve biçe, bide te; wê ji şerman rûyê wî sor bibe, ji bo ku ew xwe ji wê rewşê rizgar bike, ew ê derewekê bike. Ev e, tam di nava rê de, gava pîrejineke bi hurmet, ku riya xwe şaş kiribe, ji wî rê bipirse, ji nişka ve veciniqandina wî, li der û dora xwe mêzekirina wî û ji bo ku neqîre bi zorê xwegirtina wî ji vê tê. Bêhna qehremanê me teng dibe, rûyê wî da-

28

diliqe û bi riya xwe ve diçe. Di wê navê de gelek kes li wî dinihêrin, dibişirin, peyvan diavêjinê; keçikeke biçûk jî, ji bo ku nekeve ber lingên wî, ji ber wî baz dide, ji ber bişirîna wî ya xayizkî ecêbmayî dimîne û ew jî bi

bêedebî bi wî dikene. Lê qehremanê me qet van ferq
nake. Eynî periya xewnerojkê, ji bo mekrohî be,
pîrejina rêwî, xelkê bi mereq, keçika biçûk (Ger qehremanê
me di wê navê de di wir re derbas bûbe) ew
gundiyên ku li Fontankayê li ser mavnayên bi rêz radizan
jî - mîna ku mêş bikevin tevnepîrikan- li
gergefînê çêkiriye. Mêrik hemû niqutandiye hundurê
xwe û ketiye kulûba xwe, li ser sifrê rûniştiye, xwarina
xwe xwariye û xelas kiriye; Berdestka wî, ya
rûdaliqyayî û bi keder, Matriyona, piştî ku sifre da hev
û qalûna wî da wî, ancax ew hingî bi ser xwe ve tê, û tê
bîra wî, ku wî xwarina xwe xwariye û ew ecêbmayî
dimîne, ku wî çawan ew hemû tişt kirine. Odeya wî di
tariyê de maye, di ruhê wî de valahî û hizin heye. Ew
dinya xeyalî ya ku di serê wî de zîz dibe, hêdî hêdî
hilweşiya ye, bêî ku li dû xwe şopekê bihêle, mîna xewnerojkekê
firiyaye û çûye. Êdî nayê bîra wî bê wî çi
xeyal kiriye. Lê hîseke ku giran giran hundurê wî
diêşîne, gava xwestekeke ku dilê wî hol dike ji hêza wî
ya xeyalê xû digire, xuyayî an nexuyayî komek xeyal li
dû xwe dikşîne. Li odeya wî ya piçûk bêdengî hukum
dike; tenêtî û tiralî hêza wî ya xeyalê mist dide. Mîna
qehweya di cezweyê Matriyanayê de, ku li metbaxê
qehwê dikelîne, xeyal jî hêdî hêdî dikelin û dikevin
hereketê. Her ku diçe ev kelandin xurttir dibe, ew
pirtûka ku xeyalperestê me hema ji xwe re rahiştiyê,
berî ku ew bigihîje rûpelên sisiyan, ji dest wî dikeve.
Ev e, dinya wî ya xeyalan bi hemû hêza xwe jîndar

bûye û hatiye avakirin. Dinyayeke nû, jiyaneke xweş î nû, bi hemû rengên xwe yên têvel li ber wî ye. Xeyal ji wî re riyên dilşahiyê vedikin. Tama wê cihê, xapînok, jehreke şêrîn e! Êdî tu karê wî bi jiyana me ya rastîn re tune ye! Em di çavên wî yên ku her tiştî berevajî dibîne de, jiyaneke tirale, bêkêr, bêzar dijîn; li gorî wî, em hemû, jiyana ku bi şansa me re ne li hev e, ji xwe re barekî dihesibînin.Bi rastî jî wilo ye, ma di awira pêşî de, ne mîna ku em ji hev xeyidîne û rûyên me ji hev daliqyayî ne, Nastenka? Yê xeyalperest "Rebenino"
dibêje, gava ew me dibîne. Lê carekê jî tu li vê gerdûna balûpal ya xeyalan ku mîna tabloyeke bi rengên herî jîndar, herî berbiçav, herî efsûnker, vedibe, binihêre! Xwezayî ye ku yê herî li pêş jî xeyalperestê me ye. Serpêhatiyên cihê cihê, hulyayên bê ser û bin li dû hev dikişin û tên. Em binihêrin bê ew çi ava dike... Ma hêjaye ku mirov li vê jî bifikire?... Di xeyalên wî de her tişt heye... Ew pêşî mîna şaîrekî nenas, lê paşê jî mîna şaîrekî ku taca navdariyê li sêrî ye, dest bi karê xwe dike. Hevaltiya wî ya bi Hoffman re, Şeva Bertelemî, Diana Vernan û li dû vê jî qehremaniya Ivan Vasilyevîç ya standina bajarê Kazanê. Piştî wê jî Klara Moubray, Evfiya Dense, îfadegirtina Jean Huss ya li
meclîsa keşeyan, li Robertê rabûna miriyan. (Gelo muzîka wê tê bîra te? Mîna ku bêhna gorrê têkeve pozê mirov). Minna û Brande, Şerê Brezînayê, Danton, Kleopetra ei suoi amanti, maleke piçûk li Kolumnayê - ev

mala piçûk ya wî ye - û li wê mala piçûk melekeke min
a delal, eynî benderuheke mîna te dilovan, şevên zivistanan,
bi devê jihevmayî, li xeyalperestê me guhdarî
dike...
Ev e, wilo ye, Nastenka, ma çi qîmeta me mirovên
30
normal li ba vî peyayê ku ji tiraliyê zewqê distîne,
heye. Li gorî wî em jiyaneke reben û bi êş dijîn. Lê gava
dema wê were, bêî ku ew çavên xwe bikutkutîne, ew ê ji
bo rojeke vê jiyana reben û bi êş hemû salên xwe yên
xeyalê bide. Wê ev li demeke nexweş rast were, lê ew
qet li vê yekê nafikire. Hem jî bêî ku ew ji berdêla salên
xwe yên xeyalan kêfxweşî û dilşahiyekê bipê, ew salên
xwe yên xeyalan dide. Ew ê hizin, poşmanî, kedera
bêsînor çavên wî netirsîne. Mirov dê çi bike hê, ew
dem, ew dema bêtirs hatiye, xeyalperestê me tu xwestekan
hîs nake. Ji ber ku ew xwe di ser hemû xwestekan
re digire, her tişt li ber destên wî ne, ew hînî her tiştî
bûye... Ew jiyana xwe ava dike, her dem jiyanê li gorî
daxwaza dilê xwe dixe şikil û celebên cihê. Ev gerdûna
xeyalan wisan bi hêsanî, wisan xwezayî ava dibe ku,
mirov qet bîr nabe ku xeyal e. Ji xwe leylana ku ji
gerdûna xeyalan û ji xapandina hîsan dizê, ew hîç
bawer nake ku hulyayeke xapînok e; ev ji bo wî rastiyek
e, rastî bi xwe ye.
Ma tu nabêjî Nastenka, ji bo çi di demên wilo de xeyalperestê
me ji kêfan dike bifire? Kîjan hêz, kîjan hêza
nexuyayî lêdana nebzê zêdetir dike, hêsir ji çavan

tîne? Ji bo çi gava rûyê wî yê çilmisî û gepên wî yên şil bi kize kiz dişewitin, hemû ezîtiya wî dibe şahiyeke bicoş? Ji bo çi şevên wî yên ku di dilşahiyeke bêdawî û geş de derbas dibin, ji bo wî mîna kêlîkekê kurt tê? Qehremanê me di odeya xwe ya ku pencereyên wê bi şewqên pembe ve sor dibe, piştî buhurandina saetên bicoş, westiyayî û mîna nexweşan xwe diavêje ser nivînê xwe. Gava ew çavên xwe digire, xweşiyeke kûr hîs dike. Şewqeke xapînok ya xeyalan ku aîdî Petersburgê ye, dest pê dike û hundurê wî rohnî dike.

31

Wilo ye Nastenka! Gava mirov ji derve binihêre, mirov dê bixape û bibêje qey ew coşiya ku xwe li ezîtiya wî pêçaye, rast e. Qet ne hêsan e, ku mirov di xeyalên wilo bêbingeh de baweriya xwe bi tiştên ku bi çavan tên dîtin û bi destan tên girtin, neyne. Lê hemû derew e!... Hem jî derewên çilo ne Nastenka, çi derew!... Em bibêjin, ew dildar bûye; ew hemû coşiyên hezkirinê, liberketinên aciziyê di hundurê xwe de hîs dike... Tu berê vî biguhere û bi dîqet lê binihêre! Te hişê ku wî rûyê ya ku ew di xeyalên xwe de bêhawe jê hez dike, nedîtiye, Nastenka? Ma tu bî tu ê bawer bikî ku ew di xewn û xeyalên xwe de bi tenê hezkiriya xwe dibîne? Ma ev yeka han dikare derew be, ku wî dev ji hemû dinyayê berdaye û bi vê hezkiriya xwe re dest di dest de, dil bi dil re dijî? Gava dem dereng bibe û wextê jiheweqetînê were; wê çaxê ma ewjina ku di hewa girtî û bi bahoz de, bêî ku ew guh bide wî bayê ku hêsirên wê ji bijankên wê

yên reş direvîne û dibe, serê xwe datîne ser sînga hezkiriyê
xwe û bi qûre qûr digirî, kî ye? Bi hevbaweriya
wan, hevduxwestina wan, "Evqas sal ji kûraniyê " hezkirina
wan, gava ew bi serê xwe, bi hev re derdikevin
gerê, bexçeyê jibîrbûyî, bêdeng, wêran û bi hizin; û ma
ew riyên bexçeyan yên bi kevz xeyal bûn? Lê ew xaniyê
xerîb yê ku ji kêlik mabû? Hezkiriya wî li vir bi mêrê
xwe yê kal, bêreng û mekroh re jiyaneke girtî û tijî
keder dibuhurand. Hezkiriyên ku evînên ji hevdu jî
vedişartin, ziravên wan ji vî peyayê bi hirçînî û
hindik dipeyivî, diqetiyan. Digel van hemû xemgînî û
tirsan, evîneke wan a gelekî pak û bêguneh hebû. Lê
mirov neçê difikirin, Nastenka. (Her wilo ye). Paşê,
ew ji cî û warê xwe dûr, di binê asmanekî biyanî, ku ji
tava rojê dişewitî, li bajarekî ku tijî serpêhatiyên
32
bêdawî, li baloyeke pak ya sarayekê (Bêî sarayê hîç
çênabe!) ew pêrgî hezkiriya xwe tê. Hezkiriya wî li balkona
ku bi gelek şewqan rohnî bûye, bi gul û şaxên defneyan
hatiye pêçan, hezkiriyê xwe nas dike, maskeya
baloyê diavêje; bi dengekî ku ji heyecanê dilerize, " Êdî
ez azad im..." di berxwe de dibêje. Hezkiriyên ku hevdu
hembêz dikin, ji heweqetîna di coşiyên evînan de, liberketinên
bi êş, mêrê kal, bexçeyê nexweş yê ku li cî û
warên wan yên kevin maye, mala tijî bêhntengî, ew
kêlîka piştî maçîkirina dawî ku bi zorê ji hev vediqetin,
ew her tiştî, her tiştî ji bîr dikin.
Tam di wê navê de, ji nişka ve derî vedibe; hevalê wî

yê xort, bejindirêj, li ser xwe, zimandirêj, qeşmer, di derî de xuya dibe û mîna ku tiştek nebûbe, " Ez niha ji Pavlovskê têm!" dibêje û bi gazin dikeve hundur. Hingî mîna ku satilek av bi ser serê xeyalperestê me de bête dakirin, ew dikeve telaşeke zarokekî ku sêvek ji bexçeyê cîranê xwe dizîbe û dilebike ku wê sêvê têxe bêrîka xwe, şaş û ecêbmayî dimîne. Ew ko kontê kal miriye, riyên dilşahiyê vebûne. Vê carê jî hevalê wî yê ku ji Pavlovskayê hatiye, dibe bela serê wî.

Min peyva xwe ya bi coş bi heyecan birî û ez bêdeng mam. Ji ber ku min hîs dikir ku tu nemabû kenekî bi pîrqîn di hundurê min de biteqiya. Şeytanê di ruhê min de dest bi lebitandinê kiribû. Çenga min dilerizî, çavên min tarî dibûn, min nikarîbû bêhna xwe bigirta û berdaya. Tiştekî din jî ku ez jê tirsiyam ew bû, Nastenka çavên xwe yên zekî vekiribûn û mîna zarokan bi dînîtî û bi pirqîn dikeniya. Ez pir poşman bûbûm. Min fêhm dikir, ku ez di çîroka bi carekê ve avêtina der ya hemû hîsên ku ji mêj ve di dilê min de hilnedihatin, pir bi pêş de çûbûm. Ji ber ku min texmîn nedikir wê

33

yekî ku ji min fêhm bike derkeve, min biryar dabû ku ez hemûyî mîna ku ji pirtûkekê dixwînim, qal bikim.

Lê min nikarîbû xwe bigirta, min bêsedem hundurê xwe vala kiribû. Çi ecêb e, deng ji Nastenkayê dernediket. Wê piştî kurtedemekê, destê min hêdî şidand, bi tirseke meyildar pirsî:

- Ma bi rastî te hemû jiyana xwe bi vî awayî buhurandiye?

- Erê, Nastenka, her bi vî awayî. . . Û ez wilo bawer im
ku wê heta dawiyê jî wilo here.
Bi dengekî xemgîn:
- Na, çênabe! wê got. Divê çênebe! Ger wilo be, tête wê
maneyê ku divê ez jî hemû jiyana xwe li ber çongên
pîrika xwe bibuhurînim. Jiyaneke wilo gelekî xerab e!
Ji ber ku min nikarîbû hê bêtir hîsên xwe gem bikim;
- Ez dizanim, Nastenka, ez dizanim! min bi qêrîn got.
Ez niha ji her car bêtir fêhm dikim, ku min hemû
salên xwe yên baş vala buhurandine! Ji ber tiştê ku
bûye, ew di rûyê min dibêje, her ku ez difikirim ku
Xwedê Meleka min ya dilpak, yanî tu ji min re
şandiye, xemgîniya min zêdetir dibe. Niha gava ez li ba
te rûniştîme û bi te re dipeyivim, li pêşerojê fikirandin
bi min ecêb tê. Ji ber ku di pêşerojê de, dîsan jiyaneke
bi tenê, kufukî û bêmane li bendî min e. Gava ez li ba te,
di jiyana rastîn de ewçend dilşa bim, xeyalkirin bi
kêrî çi tê? Ji ber ku te ez tavilê red nekirim û te îmkana
ku ez du rqjan bijîm, da min, Xwedê ji te razî be!
Nastenkaya ku hêsirên wê di çavên wê de dibiriqîn:
- Na, na! Bila êdî wilo nebe! bi qêrîn got. Em ê niha
hema ji hev veneqetin! Du şev pir hindik in!
- Ax, Nastenka, Nastenka! Ma tu dizanî ku te ez
34
demeke dirêj xwe bi xwe re kirim yek? Ez ê êdî di derheqa
xwe de ewçend xerab nefikirim. Tu dizanî, belkî ez
mîna yekî ku sûc û guneh kiribe - ma jiyaneke wilo ji
sûc û guneh wêdetir çi ye ku! - ji dîtinê bigerim. Çi dibe,

tu nefikirî ku di gotinên min de nepixandinek heye. Tu
bawer dikî, carina demên min yên wilo fetisokî
çêdibin, gava ez dibînim, qeweta min tune ye ku ez jiyaneke
rastîn bijîm, ez rastiyê û bûyerên ku diherikin û
diçin bi zehmetî têdigihêm, ez korbûna hîsên xwe hîs
dikim, ez naletê li xwe tînim. Tu nizanî bê veqetandina
piştî şevên xeyalî çiqas zehmet e. Erê, yekjê jî tu ê
bibînî ku mirov bi dînîtî di nava pêla jiyanê de dijîn.
Jiyana wan ne li ser xwestinê ye, mîna xeyal û xewnerqjkan
nafirin û naçin, her tim tê guhertin, ciwan
dimîne , saetek ya din nagire. Lê xeyala ku girtiya
tarîtî û ramanê be, bê zar e. Digel amdebûna wê ya
firînê, monotoniyeke wê ya sernizm heye. Ew ewrê
rqja ku xelkê Petersburgê li ser can didin, bi carekê ve
dinixumîne, û digel nuxumandina rqjê, dilê mirovan jî
reş dike, ew xwediyê dinyaya xeyalan e; Ka tu bi xwe li
xeyalên ku di demên wilo nexweş de têne çêkirin, bifikire!
Ew xeyalên ku mirov bawer nake wê dawî were, li dû
şidandina berdewam ya rehên mirovî, hêdî hêdî
dimire, winda dibe, diçe. Ji ber ku jiyaneke we ya din
tune ye, ew dinyaya ku we ji îdealên xwe yên kevin, ji
bermayên xeyalên kevin ava kiriye, dîsan li ber
xerabbûn û wêranbûnê ye. Lê canên me tiştên din dixwazin.
Mîna ku xeyalperestê me li nava xweliyê, li
bizotên êgir bigire, ji bo dadana agirê ku dilê wî yê
sarbûyî germ bike, ew di nava kevnexeyalên xwe de li
çirûskekê digere. Agirê ku pêxîne wê bi xwîna wî
35

bikeve û wê li gerdûna xapînok a bi reng ku wî ji xwe re ava kiriye, xwe bibîne û zewqa ku hêstiran ji çavên wî tîne, bitahmîne. Tu nizane bê xeyalkirin min digihîne ku, Nastenka. Digel ku derew e û bêbingeh e, lê ji ber ku ruhê min mist dide, tiştê ku ez dixwazim bi bîr bînim, kevnehîsên min - xeyalên min yên pûç û stewr - ez êdî salvegerên wan pîroz dikim . Li gorî ez bûyereke ku xeyal dikim, najîm, ez xeyala xeyalên pûç dijîm! Ez kevnecihên ku lê dilşa dibûm ji bîr nakim, hin caran ji gera li wan deran hez dikim. Ji ber wê yekê, ez bi xwestina tama ku tama rqjên buhurî tevlî jiyana xwe ya niha bikim, di kuçe û kolanên bajêr de mîna siyekê xemgîn, bi kul û keder û betal digerim. Ma di wê navê de çi nayên bîra min! Wek mînak, gava ez digihîjim cihekî, tam mîna ku ez berî bi salekê, di eynî saetê de, bi xemgînî û bi tenê di wir re derbas bûbim, tê bîra min. Digel ku ez dizanim kevnexeyalên min hîç nexweş in, ji ber ku ez ji ber fikrên bedbîn ku pêsîra min bernadin, difetisim, difikirim ku ez berê hê bêtir bi huzûr bûm, di wê demê de jan û êşên min yên hundurîn, ku şev û rojên min li min diherimandin cihê bû, reşbîniya ku ez ji êşê digevizandim guherî bû. Ez carinan ji xwe re "Xeyalên te li ku ne?" dipirsim. Lê ji bilî ku ez serê xwe bihejînim û bibêjim "Sal çiqas zû derbas dibin" pê ve, tu çareyeke min tune ye. Vê carê pirsin din têne hişê min: "Baş e, te çi kir ji salên xwe? Te salên jiyana xwe yên herî xweş li ku veşartin? Tu jiya, an jî tu bawerî ku tu dijî?" Dengek ji hundurê min

bilind dibe: " Binihêr, tiştên li der û dora te her ku dihere çawan sar dibin? Ka bila çend salên din jî derbas bibe, tu ê bibînî ku tu bi tenê yî, kal bûyî, xwe spartiyî gopalê xwe û diricifî. Piştî wê jî bêhêvîtî,

36

keder, bêzar... Wê rojek were ku dinya min ya xeyalan ser û bin bibe, wê xeyalên min wek pelên zer yek bi yek biweşin... Ax, Nastenka! Wê çaxê hem ji bo ku ez bi tenê, tikû tenê mame, hem jî ji bo ku tiştekî min ê liberketinê namîne, ez ê li xwe xim. Ji ber ku hemû tiştên ku ez ê winda bikim, ji xeyalên bêqîmet pê ve ne tiştek in!

Nastenka hêsirê xwe pakij kir û,

- Bes e, dilê min hê zêde perçe meke! got. Her tişt êdî temam bû. Ji niha pê ve ez heme; çi dibe bila bibe, em hew ji hev vediqetin. Li min guhdarî bike. Ez keçikeke sade me. Digel ku pîrka min ji min re mamoste girtibû jî min zêde nexwend. Digel vê jî ez te fêhm dikim, ji ber ku ji çirka pîrka min kirasê min bi yê xwe ve derzî kiriye, ew tiştên te niha qal dikirin, ez jî hemûyî jiya me. Bêşik ez nikarim mîna te xweş behs bikim, ji ber ku ez nexwende me.

Di her tevgereke Nastenkayê de xuya dibû, ku wê ji peyva min ya bi coş û ji uslûba min ya bilind re hurmet nîşan dida. Bi dengekî bi tirs got:

- Lê ji bo ku te dilê xwe ji min re vekir ez dilşa me. Ez êdî dikarim bibêjim ku ez te baş nas dikim. Paşê gotineke min ya din jî heye: Ez ê jî ji te re çîroka hemû jiyana xwe bibêjim, hem jî bêî ku ez tiştekî jê veşêrim.

Tu ê li hemberî vê êqil bidî min. Tu peyayekî pir jîr î.
Tu ê alîkariya min bikî, ne wilo?
- Ax, Nastenka, min ji kesî re mamostetiyeke baş ya êqil nekiriye! Lê vê carê rewş cihê ye... Mafir ku em ê ji niha û pê ve nêzîkî hev bin, wê çaxê em dikarin bi hev re pir bipeyivin, li hevdu guhdarî bikin û hevdu şîret bikin. Êh, de bibêje, Nastenkaya min ya xweşik, tu aqilekî çilo ji min dixwazî? Her tiştên xwe vekirî bibêje! Ez niha ewqas kêfxweş, dilşa û mêrxas im; serê
37
min wilo dixebite ku, ez ê zehmetiya ku bersivan bi te ve bigihînim, nebînim.
Nastenka bi ken peyva min birrî.
- Na... Na!... Tu ê ne tenê bersiveke biaqil bidî min, herweha divê mîna ku tu bi salan ji min hez dikî, ji dil, şîreteke biratî li min bikî.
- Baş e, çêbû! min bi dengê bilind got. Ger min bîst salan jî ji te hez bikira, min ê dîsan bi qasî vê kêliyê ji te hez nekira.
- Wê çaxê destên xwe bide min!
Min destê xwe dirêjî wê kirin.
- Em ê niha jî dest bi çîroka min bikin.
38
Çîroka Nastenkayê
- Tu bi nîvê çîroka min dizanî, yanî tu dizanî ku pîrikeke min heye. . .
Min bi ken peyva wê birî:
- Ger nîvê din jî bi qasî vê kurt be.

- Hiş be û guhdarî bike. Berî her tiştî şertekî min
heye. Divê tu qet peyva min nebirî, an na ez ê xwe şaş
bikim. Niha, bi biaqilî li min guhdarî bike.
Pîrikeke min heye. Gava dê û bavê min dimirin,
pîrika min, min biçûkî dibe ba xwe. Ji ber ku ew her
rojên xwe yên xweş bi bîr tîne, ew di dema xwe de jineke
halxweş bûye. Wê ez hînî fransî kirim, wê ji min re mamoste
girt û ders da min. Gava ez ketim panzdeh saliya
xwe (ez niha hivdeh salî me) me dev ji dersan berda. A
wê demê min nerehetiyek kir. Ez ê ji te re nebêjim bê
min çi kiriye, lê tu mîna tiştekî bêqîmet bibînî. Pîrika
min sibehekê bang min kir. Ji ber ku çavên wê
nedidîtin, wê got ku, ji bo ez bikaribim li te miqate
bim, divê ez kirasê te bi yê xwe ve derzî bikim. Diviya
bû heta ku ez mezin bibûma, ez wilo bi wê ve bûma. Ez
39
demeke dirêj ji wê veneqetiyam. Gava min kar dikir,
min dirûn dikir, ez dersa xwe dixebitîm, ez bi gavekê jî
ji wê bi dûr nediketim. Min carekê xwest ez pîrka xwe
bixapînim. Min li şûna xwe Fiyolka da rûniştandin.
Fiyolka cêriya me ye, kerr e. Jinik li ser kursiya min
rûnişt. Gava pîrka min li ser qoltixa xwe di xew re çû,
ez jî çûme ba hevaleke xwe. Lê belê dawiyê qet jî baş
nebû. Gava pîrka min hişyar bûye, ji wê weye ku ez hê
bêdeng li ba wê rûniştime, loma wê tiştek pirsî ye. Fiyolka
dîtiye ku pîrka min ji wê tiştekî dixwaze, lê ji ber
ku guhên wê giran in, wê nebihîstiye. Ji ber ku wê
nizanîbû ku ew ê çi bike, wê hema derzî ji kirasê xwe

kişandiye û ji wir çûye.
Nastenka navbir da peyva xwe û bi hîke hîk keniya. Gava ez jî bi wê re keniyam, wê tavilê kenê xwe birî.
- Çi dibe, tu mekene. Ji ber ku bi min ecêb tê ez loma dikenim... Ez çi bikim, pîrka min jinikeke wilo ye. Lê ez dîsan jî hebekî ji wê hez dikim. Tenê ez bi erzşikandina wê ya wê rojê dizanim. Wê ez ji nû ve li cihê min yê berê da rûniştandin, êdî ez nikarîbûm bi gavekê jîji wê bi dûr biketima. Haa, min ji bîr kir ku ez bibêjim, maleke me, yanî maleke pîrka min heye. A rastî xaniyekî me yê ji text û sêpaceyî, mîna pîrka min kone û biçûk heye. . . Odeyek jî li jor heye. . .
Min dest bi peyvê kir:
- Dêmekê kirêdarê we yê kevin jî hebû? min jê pirsî.
- Erê, hebû... Hem jî ew ne weke te geveze bû. Te nikarîbû devê wî bi kêrê vekira. Ew kaloyekî lal, kerr, kulek û piştxûz bû. Ji ber zehmetiya jiyaneke bi wî celebî, wî debar nekir, mir. Em fikirîn ku wê bêî kirêdarekî zehmet be, me rabû di şûna wî de yekî din girt. Berevajiya kalo, evê nû, yekî xort bû. Ew ne ji vir
40
bû, ji gund hatibû. Ji ber ku wî bi me re bazar nekir, pîrka min tavilê ode da wî. Paşê, "Kirêdarê me yê nû çawa ye nastenka? Ew xort e, kal e?" wê pirsîbû.
Min nexwestibû ez derewan bikim.
- Ne ewqas xort e, lê ne kal e jî, min gotê.
Pîrka min dixwest bi her tiştê wî bizanibe.
- Baş e, ew çawan dixuye? Ma ew çeleng e?

Min dîsan ya rast jê re got:
- Erê, pîrkê, ew çeleng e. . .
- Dêmek ez ê pir bikişînim. Binêr keça min, paşê tu nebêje "pîrka min ji min re negot", tu tu bî, tu dil nekevî vî camêrî. Ka em binêrin bê wê çi were serê me.
Ji ber ku mêrikê xerîb odeya me kirê kiriye, ew di çavê me de şêrîn dixuye. Ma berê wilo bû?
Rojên berê ji devê pîrka min dernediketin. Berê ew ciwantir bû, germa rojê zêdetir bû, dawiya şîr weke niha zû nedihat. Her tiştê berê baş bû. Ew tiştên ku pîrka min di derheqa kirêdarê me de ji min re gotin, şîretên ku li min kirin, min hemû li ser hev carekê bi bîr anîn.
Lê paşê gava min dest bi nexşan û hûnandina goreyan kir, min ew hemû ji bîr kirin.
Kirêdarê me sibehekê hate ba me. Ew ê pîrka min kaxez li dîwarên odeya bi kirê bixista, ew hatibû ku wê yekê di bîra pîrka min de bîne. Peyvê peyv vekir...
Pîrka min jî zêde napeyive. Di navberekê de ji min re got:
- Heydê Nastenka, here oda min û qutîka min a hesaban bîne.
Ez tavilê rabûm. Rûyê min weke sêlê sincirî bû. Ji ber ku di wê navê de min ji bîr kiribû ku kirasê pîrka min bi kirasê min ve derzîkirî bû, bi holbûna min re qoltixa pîrka min jî wergeriyabû û bi dû min de hatibû
41
kişandin. Ji ber ku li hemberî kirêdarê me hemû foya min derketibû meydanê, rûyê min hê bêtir sor bûbû, ez

kirî ji fediyan têketima binê erdê. Hema min got kûr û ez giriyam. Ger hingî erd biqelişiya û ez têketimayê çêtir bû.
Gava pîrka min bi qêrîn got:
- Tu çi sekinî yî ?
Hingî îskîna min zêdetir bû. Gava kirêdar têgihîşt ku ez ji wî fedî dikim, wî xatir ji me xwest û çû.
Piştî wê rojê, her ku ez li korîdorê dengê teperepa lingên kesekî bibihîzim, ziravê min diqete. Bi fikra ku wê kirêdarê me were, ez kirasê xwe ji yê pîrka xwe diqetînim. Lê her carê jî ne kirêdar, lê yekî din dihat. Du hefte wilo bihurîn. Rojekê kirêdarê me bi Fiyolkayê re xeber şand ku komek pirtûkên wî yên bi fransî, xweşik û hêjayî xwendinê hene. Wî gotibû ku pîrê aciz e, ger ez bixwazim jê re bixwînim, ew dikare wê koma pirtûkên xwe ji me re bişîne. Pîrka min bi kêfxweşî qebûl kir. Lê wê mereq dikir, bê bi rastî ew pirtûk baş in an na.
- Ev ne pirtûkên exlaqxerabkirinê bin, Nastenka, wê got. Ez pirtûkên wilo bi te nadime xwendin, tu ê bi xwendina pirtûkên wilo hînî tiştên ne baş bibî.
- Ew tiştên nebaş ku tu dibêjî çi ne, pîrkê? Ma di van pirtûkan de çi hene?
- Ma te got çi di wan de hene? Di wan de xortên ku keçikên malbatên baş ji rê dibin, soza zewacê didine wan û paşê wan li kuçeyan berdidin û keçik dikevin rewşên ku gunehê mirov bi wan were, hene. Min gelek pirtûkên wilo xwendine keça min; gava mirov wan

dixe destên xwe, êdî ne xew dikeve çavên mirov û ne tiştekî din... Ji ber vê yekê tiştên ku ez dixwazim ji te re
42
bibêjim ev e: Tu destên xwe bi wan meke! Ka ez binihêrim bê wî çi pirtûk şandine.
- Hemû romanên Walter Scott in, pîrkê.
- Te got romanên Walter Scott in? Di vê de fenek tune be? Eman keça min, dîqet bike, di nava rûpelên pirtûkan de nameyên evînî tune bin.
- Tiştekî wilo tune ye, pîrkê.
- Tu li nava cildan binihêre. Aqilê mirov nagihîje karên hîlekarên wilo.
- Di nava cildan de jî tiştek tune ye.
- Êh, wê çaxê baş e.
Me bi vî awayî dest pê kir û Walter Scott xwend. Di hundurê mehekê de me nîvê pirtûkan xelas kir. Kirêdarê me ji me re bêî navbir pirtûkên nû dişand. Vê dawiyê wî çend heb jîji Pûşkîn şandin.
Wilo bûbû ku ger pirtûkên nû nehatana, bêhna min teng dibû. Ez êdî hew li zewaca bi kurê Padîşahê Periyan re difikirîm.
Çawa bû, ez nizanim, lê ez rojekê li ser pêlikê pêrgî kirêdar bûm. Pîrka min ez şandibûm da tiştekî bikirim. Mêrik sekinî. Rûyê me herduyan jî sor bû. Lê ew tavilê keniya û silav da min. Paşê wî li hal û wextê pîrka min pirsî û meraq kir bê min ew pirtûk ji wê re xwendine an na. Min jî jê re got, ku min ew xwendine. Wî hingî ji min pirsî:

- We herî pir ji kîjan pirtûkê hez kir?
Minjîjê re got:
- Ji berhemên Ivanhoe û yên Pûşkîn.
Peyva me ya wê çaxê ewqas dom kir.
Piştî hefteyeke din ez dîsan li ser pêlikê pêrgî wî hatim. Vê carê pîrka min ez neşandibûm, min derewek li hev anîbû û ez derketibûm. Saet sisiyê piştî nîvro bû.
43
Kirêdarê me her tim di wê saetê de dihate malê.
- Rojbaş, wî got.
Min jî bersiva wî da:
- Rojbaş.
- Ma tu aciz nabî ku tu hemû rojê li ba pîrika xwe rûdinê?
Ji ber wê gotina wî min wilo şerm kir, wilo şerm kir, ku tu nizanî! Pir li zora min çûbû, ku wî bi rewşa min dizanîbû. Herçiqas min nexwest ez bersiv bidim û ji ba wî bi dûr bikevim jî, lê min nikarîbû. - Tu keçikeke qenc î, wî got. Ji ber vê gotina min ez lêborînê dixwazim. Bawer bike, ez ji pîrka te bêtir qenciya te dixwazim. Ma keçikên hevalên te yên ku hûn herin ba hev û hevdu bibînin tune ne?
Min jê re got, tune ne. Bi tenê Maşenka hebû, ew jî çûbû Pskovayê.
- Tu bi min re nayê Operayê?
- Opera? Lê em ê çi bikin ji pîrka min?
- Em ji wê re nabêjin.
- Çênabe, ez nikarim pîrka xwe bixapînim. Di

xweşiyê de bimîne.
- Oxirbe.
Jê pê ve wî tiştek negot.
Piştî şîvê min dît ku ew hate ba me. Ew li ba me rûnişt û em tibabekî peyivîn. Li hebûn û tunebûna nasên me pirsî û meraq kir bê pîrka min diçe ku derê.
Paşê bi carekê ve:
- Min îro li Operayê, ji bo Berberê Sevîlayê locayek veqetandiye. Ez ê bi hevalan re biçûma, lê karê wan derketiye, ew nikarin werin. Bilêt di destên min de mane.
Pîrka min bi kêf:
44
- Berberê Sevîlayê? jê pirsî. Ne ew Berberê Sevîlayê yê ku di ciwaniya min de dileyist be?
Kirêdar:
- Eynî ew bi xwe ye! got. Wî di bin çavan re jî li min nihêrî. Min wê çaxê rewş fêhm kir, rûyê min sor bû, dilê min bi gurmînî lêxist.
- Dêmek ew Berberê Sevîlayê yê kevin... hey gidî dinyayê, hey!... Di ciwaniya min de li mala me dikeke me ya biçûk hebû. Li ser wê dikê Rozîna hatibû leyistin.
- Ma tu naxwazî îşev Berberê Sevîlayê bibînî? Qet nebe bila bilêtên min neşewitin.
Pîrka min qebûl kir.
- Baş e, em herin. Nastenkaya min hê nizane bê opera çi ye.
Ez nikarîbûm ji kêfan li cihê xwe rawestiyama. Em

hema rabûn, me xwe hazir kir û em ketin rê. Ji ber ku
çavên pîrka min hew didîtin, ew tenê hatibû ji bo ku li
muzîkê guhdarî bike. Ya rastî wê ew yeka han ji bo min
kiribû. Çawa be jî dîsan pîrka min jinek bû. Lê ger bi
me bimaya, me ê gava xwe neavêtiba derve. Ez ê ji te re
behsa ku Berberê Sevîlayê çawa bû, nekim. Heta ku
Berberê Sevelîyayê tewaw bû, kirêdarê me wilo bi
çavekî mistdayîn li min dinihêrî, ew wilo xweş dipeyivî,
ku min tavilê fêhm kir ji bo ku ew min biceribîne,
wî ez bi roj vexwandime operayê. Ez ji kêfan di qalikê
xwe de hilnedihatim. Ez wê şevê gelekî ji xwe razî bûm,
ez bêhawe dilşa bûm. Dilê min bi şidet lêdixist, agirê
min jî hebekî bilind bûbû. Berberê Sevîlayê hemû şevê
hate xewna min.
Min texmîn dikir ku ew ê piştî wê şevê her tim were
mala me, lê hîç ne wilo bû.Tu nema bû wî çûyin û
45
hatina xwe bibiriya. Ji mehê carekê, ji bo çûyina
operayê li deriyê me dixist. Em carek du carên din jî bi
wî re çûne operayê. Lê ew yeka han qet li xweşa min
nediçû. Min dizanîbû ji ber ku gunehê wî bi min dihat
wî em diezimand. Ma wê jê pê ve ji ber çi bûya? Her ku
roj derbas dibûn, ez diketim rewşeke ecêb, nikarîbûm
di cihê xwe de rawestiyama. Ne min dikarîbû pirtûk
bixwendina, ne jî min dikarîbû tu karên destan
bikira. Cama jî kenekî ez digirtim, min pîrka xwe diqeherand,
cama jî ez ji dil digiriyam. Dawiyê ez wilo
jar bûm ku tu nemabû ez têketima nava nivînan. Demsala

operayê derbas bûbû. Kirêdarê me êdî qet nedihate seredana me. Gava em pêrgî hevdu dibûn jî - ew jî her tim li ser pêlikê dibû- mîna ku wî nedixwest ew bi min re bipeyive, wî bi cidî silav dida min û tavilê ji wir bi dûr diket. Ê min jî rûyê min sor dibû û ez wilo di nava pêlikan de dimam. Ji xwe gava ez pêrgî wî dibûm, xwîna min dadiwerivî mêjiyê min.

Eh, wextî dawiya çîroka min were. Ta di gulana par de wî hat ji pîrka min re got, ku karê wî yê li vir xelas dibe û ew ê ji bo salekê here Moskovayê. Gava min ew bihîst, aqil di serê min de nema, hema ez li ser kursiya xwe rûniştim. Baş bû ku wê yeka han bala pîrka min nekişand. Kirêdar jî xatir ji me xwest û çû.

Baş e, min ê niha çi bikira!... Ez fikirîm, ez çûm û hatim û min paşê biryara xwe da. Ew ê sibehê biçûya. Ji bo ku ez bikaribim biryara xwe bi cih bînim, ez li bendî razana pîrka xwe rawestiyam. Mîna ku ez fikirîbûm jî min kir. Min hemû kincên xwe pêçan, xistin buxçikekê, rahişt buxçikê û ez çûme banî, odeya kirêdar. Te digot qey xwîn ji damarên min hatibû kişandin. Heta odeya jor bi min bi qasî saetek rê

46

hatibû. Gava min derî vekir û ez ketim hundur, mîna ku kirêdarê me sawêr (şevreşk) dîtibe, ew ji cihê xwe hol bû. Lê gava ew têgihîşt ku ez bi zorê li ser lingên xwe radiwestim, wî baz da û ji min re qedehek av anî. Ji lêdana dilê min, mêjiyê min digizgizî. Serê min tevliheh bûbû. Gava ez hebekî bi ser hişê xwe ve hatim, min

buxçuka xwe danî ser nivîna. Min jî hema xwe li wir da erdê, bi destan ser çavên xwe nixumand û hêsirên min mîna baranê diherikîn. Wî her tişt fêhm kiribû. Rûyê wî zipîzer bûbû û ew li pêşberî min rawestiyabû bû. Gava min ew nêrînên wî yên xemgîn dîtin, tu nema bû dilê min biperçiviya.

- Binêr Nastenka, wî dest bi peyvê kir. Ez mirovekî belengaz im. Ne pere û pûlê min û ne jî karekî min î bi rêk û pêk heye. Ger em bizewicin, ez ê çawan we xwedî bikim?

Em pir peyivîn, min nikarîbû zora qehra xwe bibira. Min jê re got, ku ez hew dikarim li ba pîrka xwe, kirasê min bi kirasê wê ve derzîkirî rûnêm, ez ê bi çolan bikevim; min jê re got, ger ew bixwaze, ez ê bikaribim bi wî re herîme Moskovayê. Min bi ser vekir, ku ez ê nikarîbim bêî wî bijîm. Şerm, hezkirin, gûrûr; hemû hîs di hundurê min de tevlihev bûbûn. Ji heyecanê tebatî nedikete min, min xwe avêt ser nivînê wî. Ez ditirsiyam ku ew ê xwesteka min bi paş ve vegerîne.

Ew çend deqîqeyan ji cihê xwe tevneliviya. Paşê rabû, hate ba min û bi destê min girt. Çavên wî jî şil bûbûn.

- Caria min, Nastenka, keçika min a dilpak, li min guhdarî bike. Ez ji te re soz didim ku ez ê rojekê werîme dereceya zewacê, hingî dilşahiya min ya jiyanê wê tu be. Ez ê niha herim Moskovayê, ez ê li wir bi qasî

47

salekê bimînim. Ez hêvîdar im ku ez ê bikaribim karê

xwe têxime rê. Gava ez vegerim, ger te ez ji bîr nekiribim, em ê bizewicin û dilşa bibin. Ez ji te re soz didim.
Lê niha nabe, hîç mafê min tune ye ku ez ji niha ve ji te re soz bidim. Ev e, ez dîsan dibêjim, ger piştî salekê jî nebe, ew ê ji sedî sed rojekê bibe. Dibe ku tu yekî ji min çêtir bibînî. Ji ber vê yekê ez naxwazim te bi soza xwe ve girê bidim.
Piştî wan gotinan jî, dotira rojê ew rabû û çû. Min biryara xwe dabû, ji tiştên ku em peyivîne, ez gotinekê jî ji pîrka xwe re nabêjim. Wî wilo xwestibû. Ev e, hêdî hêdî dawiya çîroka min tê. Saleke wî tijî bûye, ev tam sê rojên wî ne ku ew li vir e.
Ji bo ku ez dawiya çîroka wê bibihîzim ez bêsebir bûm.
- Ê, paşê, min bi dengekî bilind got.
Mîna ku Nastenka bi zehmetî dipeyivî.
- Ew hê jî nexuyaye. Ez tu xeberê ji wî nabihîzim.
Ji wê pê ve jî bêî ku ew bipeyive, ew demekê sekinî. Wê serê xwe bera ber xwe dabû. Lê sînga wê bi carekê ve ji ber îskînê hejiya. îskînên wê dilê min perçe dikir. Ez qet ne li bendî bûm ku ew ê wilo dawî were. Min bi dengekî bi tirs û bi fedî got:
- Nastenka, ji bo Xwedê megirî!... Tu ji ku dizanî, belkî ew hê nehatiye. . .
- Na, ez dizanim, ew li vir e. Berî ku ew here bi şevekê, me ji hev re soz dabû. Min ji te re behs kir bê em li ser çi peyivîbûn. Em wê rojê hatibûn vir, em li vir meşiyabûn. Em li ser vê textebendê rûniştibûn, saet

dehê şevê bû. Ez êdî nedigiriyam. Min bi şîrînî li gotinên wî guhdarî dikir... Wî got, gava ew ji Moskovayê vegere ew ê were mala me û ger ku ez wî red nekim
48
ew ê her tiştî ji pîrka min re bibêje. Ez dizanim niha ew li vir, lê va ye ew nehat!. . .
Wê wilo got û dîsan giriya. Ez bi xemgînî ji cihê xwe pekiyam.
- Raweste cana min, em ê helbet riyekê ji vê liberketina te re bibînin! Binêre Nastenka, gelo ez bi xwe herime ba wî çawa ye?
Wê serê xwe bilind kir û li min nihêrî:
- Ma tiştên wilo dibe?
Min hebekî xwe da hev:
- Wilo ya, çênabe, min gotê. Ha, riyeke din jî heye. Ji wî re nameyekê binivîsîne.
- Ev qet çênabe, ez di jiyana xwe de nikarim tiştekî wilo bikim.
Lê ez li ser sekinîm.
- Çima çênabe? Name ji namê ferq dike. Tiştê pêwîst celebê nivîsandina wê ye. Ger tu bi a min bikî, ev fikreke baş e. Dîsan jî tu dizanî Nastenka, ez şîreteke xerab li te nakim. Wê her tişt têkeve rê. Li gorî ku te gava pêşî avêtiye, nihajî...
- Na, çênabe, ev dibe mîna ku ez bi zorê xwe dixime stûyê wî. . .
Êdî ez vekirî bişirîm:
- Ax, Nastenkaya min ya dilpak! Tu nerast difikirî.

Ger wî ji te re soz dabe, wê çaxê heqê te heye ku tu li wî bigerî. Gorî ku min fêhm kiriye, ew ê peyayekî kubar be. Ew li hemberî te durust tevgeriyaye.
Her ku diçû, baweriya min bi rastiya fikrên ku min berpêş dikirin û bi mantiqiya delîlên min dihat.
- Ew bi rastgoyî tevgeriyaye. Xuya ye ku wî xwe bi soza xwe ve girê daye. Ger wî gotibe ku ew ê bi te re bizewice, ew ê bi te re bizewice û di ser re jî tu azad hiştiye, ma tu
49
hê çi dixwazî? Wê çaxê tu dikarî pêşî dest bi vê meseleyê bikî. Ji ber ku mafê te heye. Ji ber ku tu bi awantaj î. Em bibêjin ku te mêrik nexwesta, wê çaxê te ê çi bikira?
- Çîk. . . ger tu bûya te ê çawan binivîsanda?
-Çi?
-Name, lo...
- Tu dizanî min ê çawan binivîsanda? Min ê pêşî bi "Mîrza" dest pê bikira.
- Gelo çênabe ku ez ne bi "Mîrza" dest pê bikim?
- Çênabe! Lê çima çênabe? Bi min bimîne...
- Ê, paşê?
- "Mîrza ez lêborînê dixwazim"... Na, na, ne hewce ye ku tu lêborînê filan bixwazî. Rewşa te ya biheq li navê ye. Tu dikarî nameyeke germ binivîsînî:
- Ez ji te re berê dinivîsînim. Li bêsebiriya min megire. Piştî ku ez salekê li bendî te mame, niha nikarim rojeke din jî bimînim, nizanim çiqas rast e. Erê, tu hatiyî vir, ma nabe ku tu fikra xwe biguherî? Tu

maneya ku ez di nameya xwe de gazinan dikim, an jî te sûcdar dikim, dernexî. Ji ber ku min nikarîbû li dilê te hukum bikira, ez ê te sûcdar nekim. Ma ez çi bikim, qedera min wilo ye!
- Tu mirovekî bi esil î. Ez hêvîdar im ku tu ê van çend rêzên ku bêsebiriyê bi min daye nivîsandin, di cih de bibînî. Vê jî ji bîr meke, ya ku ev nivîsandiye, yekî nêzîk ku ew pê bişêwire, tune ye. Vê jî ji bîr meke, ev name ji aliyê rebeneke ku nikare zora dil bibe, hatiye nivîsandin. Hema ji bo kurtedemekê be jî, ji ber vê şika ku ketuye hundurê min, min efû bike. Ez dizanim ku tu ê nikaribî yeka ku ji te hez kiriye û hê jî ji te hez dike, bişikînî.
50
Nastenkaya ku çavên wê ji kêfan diçûrisîn:
- Erê, tam mîna ez fikirî me! bi qêrîn got. Te hemû şikên min dane alî. Xwedê te ji min re şandiye. Ez spas dikim, pir spas dikim.
Min bi heyranî li rûyê keçikê yê şên dinihêrî.
- Tu çima spas dikî, Nastenka? Ma ji bo ku Xwedê ez ji te re şandime?
-Erê.
- Ax Nastenka! Em şikir dikin ku hin celebmirov di nava me de dijîn. Ez jî bi eynî dilşahiya te, bi dîtina te dilşa me.
- Baş e, wê bigihîje, bigihîje! Niha tu li min guhdarî bike. Soza me wilo bû: Çer ku ew ji Moskovayê vegeriyaya, wî ê nameyek bidaya yekî dilpak, ku ji çîrokê

bêhay bû. Gelo ji ber zehmetiya di nameyê de nivîsandina her tiştî wî dev jê berda? Li gorî soza ku me ji hevdu re dabû, ew ê saet di dehan de bihata vir. Ez dizanim ku ew hatiye; lê digel ku sê rqj di navberê re derbas bûne, wî ne nameyek şandiye, ne jî ew bi xwe hatiye. Bi rojan ez nikarim ji ba pîrka xwe bilivim. Ji ber vê yekê, tu vê nameyê bibe ji wî nasê min re. Ew ê ji navnîşana wî re bişîne. Ger bersiv were, tu sibehê saet di dehê êvarê de bîne vir.

- Baş e, lê name! Te hê name nenivîsandiye! . . . Ancax tu bersivê adinî rojê bistînî.

Mîna ku ew şaş mabû:

- Te got name? Erê, çîk. . .

Zimanê wê li hev geriya û sekinî. Wê rûyê xwe yê ku spîsor bûbû, bi aliyê din vekir. Min di wê navê de jî hîs kir ku wê zerfek xistiye nava destên min. Ev zerfa ha nameyeke ku berê hatibû nivîsandin û devgirtî bû. Di bîra min de rûyekî narîn û şên bi ruh dibû.

51

- Ro - Ro,s,î-sî,n,a-na! min dest pê kir.

Paşê me herduwan bi hev re got:

- Rosîna!

Min wextî ji kêfan ew hemêz bikira. Sorbûna rûyê wê hê derbas nebûbû. Gava ji bijankên wê yên reş hêsirên mîna înciyan dirijiya, ew dikeniya. Paşê wê zûka got:

- Eh, ew ê îro bigihîje. Di xweşiyê de bimîne! got.

Name di destê te de ye, navnîşana ku tu ê bibiyê jî li ser nivîsî ye. Heydê, di xweşiyê de bimîne, em ê sibehê

hevdu bibînin.
Wê bi herdu destê min girt û bi hemû hêza xwe guvaşt.
Paşê wê bi serê xwe silav da û kete kuçeya mîna tîrekê.
Min tibabekî li dû wê nihêrî. Gava ew di tariyê de ji ber
çavan winda bû: "Erê, sibehê... heta sibehê! min di dilê
xwe de got.
52
Şeva Sêyemîn
îro hewayek ne xweş, bi baran û keder heye; eynî
mîna kalîtiya min ya pêşerojê - komek hîsên xerîb,
fikrên reşbîn û pirsên ku ez nikarim ji xwe re şirove
bikim, ji sibehê de serê min tev dide, lê bi qasî ku ez nikaribim
vê zelal bikim, xwestekeke wilo jî hîs nakim.
Ji xwe ma qey ez rnirovekî wilo me ku!
Em ê îro hevdu nebînin. Gava em do ji hev veqetiyabûn
der û dor mij girtibû, asman bi ewran hatibû nixumandin.
Min ji bo îro gotibû ku wê hewa ne xweş be.
Lê Nastenka bersiv nedabû; mîna ku wê nedixwest ew ji
kehaneteke xerab bipeyive. Ji bo wê do rojeke sayî û
rohnî bû; tu ewran zora dilşahiya wê nedibir.
- Ger baran bibare, em ê nikaribin hevdu bibînim, wê
gotibû. Ez ê nikaribim werim.
"Belkî Nastenka barana îro ferq nekiribe" ez fikirîm,
lê ew bi rastî jî nehat.
Do hevdudîtina me ya sisiyan bû. Şevên me yên spî û
sêyemîn bûn. . .
Xwedêyo, kêf û dilşahî mirovan çiqas xweşik dike,
dilê mirov ji dilşahiyê çiqasî şêlav dibe! Te digot qey

ev şêlavbûna dil, ji bo ku mirov berde dilê hinin din, ji bo ku her tişt di kêf û şahiyê de bimîne, bikene, bireqise, bû. Bi rastî ez li dilşahiyeke wilo rast nehatime! Di gotinên Nastenka yên do de, li hemberî min dilovaniyî û nêzîkahiyeke mezin dihate fêhmkirin. Wê xwe nêzîkî min dikir, yeka min nedikir dido, ji bo ku ew xwe têxe çavên min, şaş bûbû bê ew ê çi bikira. Nazdariyeke wê ya dilşabûnê hebû. Ez... ez jî baweriya xwe bi van tînim, ya wê ku li hemberî min... Lê ez çawan wilo fikirî me? Mirovek nikare evqasî kor be, ku nebîne, ev hemû tişt ji bo hinin din têne kirin. Ew dilovanî, pûtepêdanî û hezkirin... erê, ji ber hezkirina min, dilşabûna wê ya hevdudîtina bi yekî din re, min çawan fêhm nekiriye ku ji dilşabûna ku bi min re bi par ve dike, tê.

Piştî sehinandina vala, gava mêrik nehat, Nastenka mirûzê xwe kir, veciniqî û bi tirs ket hev. Tevgera xwe, nazdariya peyva xwe ya berê, şênîtiya xwe ya pir winda kir. Ne ecêb e; ya ku esil bala wê kişande ser min, tirsa wê ya ku ew ê negihîje dilşahiyê bû! Nastenkaya reben; tirsa wê, ecêbmayîbûna wê ewqasî zêde bû, di dawiyê de têgihîşt ku ez ji wê hez dikim û di wê demê de jî gunehê wê bi hezkirina min ya xêrnedî dihat. Ma her tim ne wilo ye? Gava em xemgîn bin, em xemgîniya hinin din kûrtir hîs dikin. Hîs wan çaxan zirav û bi hêz dibin. Ez bê sebir li benda saeta hevdudîtinê bûm û ji bo dîtina Nastenkayê ez bi heyecan

reviyam. Ma ji ku dihate bîra min ku ev hîsên min yên niha wê wilo bibin, û ev yeka han ne mîna ku ez dixwazim wê dawî were? Ji kêfan çavên Nastenka diçûrisîn û li hêviya bersivê bû. Bersiv ew hezkiriyê wê bû, ku ew ê bi banga wê re bi bazdan bihataya. Ew tam

54

saetekê berî min hatibû. Ew pêşî bi her tiştî, bi her gotinên min bi pîrqîn keniya. Gava carekê dît ku ez napeyivim,

- Tu dizanî bê ez çima evqasî dilşa me? Gava ez li te dinihêrim, dilşabûna min zêde dibe. Ez îro evqasî ji te hez dikim ku.

- Wilo ha? min gotê.

Dilê min bi lez lêdixist.

- Ji ber ku dilê te neketiye min, ez evqasî ji te hez dikim. Ger di şûna te de yekî din bûya, ew ê bela xwe di min bida, wê rehetî nedaya min; bi ax û oxan wê bi derewan rola dildaran bikira. Lê tu dostekî ji can î.

Wilo got û destê min ewqasî guvaşt ku wextî ez biqîriyama. Piştî ku ew demekê keniya, rûyê wê bi carekê ve cidî bû.

- Hem jî tu dostekî wilo ji can î, ku behskirina wê zehmet e. Xwedê te ji min re şandiye! Ger tu niha ne li ba min bûya, kî dizane bê ez ê têketima çi rewşê. Ya girîng tu ne menfeetperest î. Li hemberî min jî hezkirineke te ya pak heye. Piştî ku ez bizewcim jî, em ê dîsan dostên hev bin, dostên ku ji xuşk û biratiyê jî nêzîktir.

Ez ê hema hema bi qasî ku ez jî wî hez dikim, ji te jî hez

bikim. . .
Min di wê navê de xemgîniyeke bêhawe hîs kir, dîsan
jî, li ku be, wextî ez bikeniyama.
- Nexweşiyeke te ya ruh heye, min jê re got. Bi fikra
ku ew nayê, di hundurê te de tirseke ecêb heye.
- Bijî! Ger ez hê hindiktir dildar bûma, ez dikarîbûm
ji ber bêbawerî û gazinên te bigiriyama. Lê... Çîk... ev
fikra ku te xiste serê min, xuya ye wê min rehet nehêle.
Neyse, ez ê paşê li van bifikirim. Ez çi derewan bikim,
ya ku te gotibû rast bû. Erê! Mîna ku ez ne li ser hişê
55
xwe bûm, ez zipîziwa bûbûm; diltepîna min ji ber vê bû.
Ooh, em niha dev ji mijara tirsê berdin.
Di wê navberê de dengê teperepa lingan hatin
bihîstin, hew me dît ku yek di tariyê de ber bi me ve tê.
Em herdu jî diricifîn. Nastenka ji bo ku negirî bi zorê
xwe girt. Min destê keçikê berda, min xwest ez ji wê bi
dûr bikevim. Lê em xapiyabûn, yê ku dihat ne ew bû.
Nastenka dîsan destê xwe dirêjî min kir:
- Tu çima tirsiya? wê ji min pirsî. Te çima destê min
berda? Çi ji vê derdikeve? Em bi hev re herin pêşiya wî.
Ez dixwazim ew bibîne bê em çiqasî ji hevdu hez dikin.
Min xwe negirt:
- Bila ew bibîne bê em çiqasî ji hevdu hez dikin!
Di wê navê de ez li van difikirim:"Ax Nastenka, Nastenka!
Ma tu dizanî bê tu bi van gotinên xwe çi dibêjî!
Ma dihate hişê te ku hezkirineke wilo dilê yekî dike
mîna qeşayê, ruhê yekî reş dike? Destê te mîna qeşayê

ye, lê yê min ji german dişewite... Çavên te girtî ne, Nastenka!
Ax, miroveke dilşa carinan çiqas zehmet dibe!
Lê ji te hêrsbûn ne di destê min de ye.
Min ê zêdetir debar nekira.
- Ez ji te re behs bikim bê îro çi bûye?
- Çi bûye? Ma tiştek bûye? Heydê behs bike! Çima tu ji
mêj ve bêdeng î?
- Min pêşî ew karê ku te dabû min, kir. Min çû ew
nameya han da nasên te. Dû re jî gava ez vegeriyam
malê, ez razam.
Nastenka bi kêf peyva min birî:
- Hemû ev bû?
Min hîs kir ku di çavên min de hêsirên ehmeq
çêdibin, min ne ji dil got:
56
- Hema hema evqas. Ji hevdudîtina me re çend saet
mabûn ku ez şiyar bûm, te digot qey ez qet ranezabûm.
Ez nizanim çi bi min hat. Gava ez hatim, min dixwest
ez ji te re behsa van bikim.
Dem rawestiyabû, di wê navê de mîna ku hîsên di
hundurê min de bêdawî bûbûn, mîna ku wê dem heya
bêdawiyê biçe û min hîs dikir ku wê jiyan ji bo min raweste.
Gava min çavên xwe vekirin, straneke xweş,
mîna ku min ji mêj ve bihîstibe, ji ber kiribe û paşê ji
bîr kiribe, di guhên min de dihate gotin. Ev straneke
wilo bû, ku heya ez li jiyanê bim, dixwest ji ruhê min
biqete û here, wê niha firsend dîtibû. . .
- Pir ecêb e! Ev tiştekî çilo ye? Min ji vê tiştek fêhm

nekir.
- An na min çiqasî dixwest ku ez ji te re behsa vê hîsa
ecêb bikim, Nastenka!
Ji dengê min yê bi bergerîn, hêviyeke jar û veşartî dadiwerivî.
Ax, Şeytan! Wê tavilê fêhm kiribû.
- Bes e, niha dev ji van berde, got.
Ew di wê navê de jî kete hewayeke şên û kete milê
min. Ew bêî navbir dikeniya û dixwest ez jî bikenim.
Her gotina ku min bi şermokî digot, wê bi hîke hîk dibersivand...
Tam ez wextî hêrs bibûma, vê carê jî wê
nazê xwe kirin.
- Binêre bê ez ê ji te re çi bibêjim. Ji bo ku dilê te neketiye
min, ez hebekî li ber xwe dikevim. Mirov çi benderuhên
ecêb in, ne wilo ? Lê, ey dostê min, yê serbilind,
tu nikarî bibêjî ji ber ku ez keçikeke saf im tu min
naecibînî. Ji ber ku ez ji te re her tiştî, her fikrên pûç jî,
yên ku di hişê min de derbas dibin, dibêjim.
- Ka raweste, ez bawer im zengilê saeta yanzdehan
lêdikeve!
57
Ji derveyî bajêr, dengê zengilê dêrekê bi pîvan û gurr
dihat. Nastenka bi carekê ve sekinî. Wê dev ji kenê xwe
berda û lêdanên zengil hejmartin. Paşê bi dengekî bi
tirs û bê biryar got:
- Erê, yanzdeh.
Ez di wê navê de poşman bûbûm ku min ew tirsandibû
û lêdanên zengil bi wê dabûne hejmartin. Û ji bo
ku kîna min zora min biribû, min nalet li xwe anî. Bi

xemgîniya keçika reben re, ez li riyên lêbûrîna qusûra xwe digeriyam. Ji bo ku ez dilê wê têxim cih, min delîlên cihê, sedemên nêzîkî aqilan, jê re tanîn, û jê re şirove kir ku bê ji bo çi mêrik nehatiye. Di wê navê de, tu kes weke Nastenka bi hêsanî nedihate xapandin. Her kesê ku di eynî rewşê de ye, ji gotinên xapînok ku têne gotin, bi qasî serê derziyê ger rastiyekê tê de bibînin, ew xwe bi mh û can lê dipêçin.

Ez bi xwe jî dibûm heyranê şirovekirina delîlên ku min berpêş kiribûn, her ku çû ez bi dengê bilind dipeyivîm.

- Ya rastî em mirovên ecêb in! Ca bifikire, ew ê çilo bihata! Nastenka, we ez xapandime û we serê min wilo tevlihev kiriye, ku min hesabê demê jî ji bîr kiriye. Dibe ku wî hê nû name girtibe. Paşê, belkî ji bo ew nikare were, ew difikire ku bersiva nameya te bide. Ji xwe name berî sibehê nayê. Ez ê sibehê zû lê binihêrim û tavilê haya te bigihînimê. Her tişt tête bîra mirov. Ser qisê, dibe ku name jê re here û ew ne li mal be. Anjî dibe ku hê name negihîştibe destên wî. Her tişt dibe...

- Rast e, ez li van nefikirî bûm. Bêşik her tişt dikare bibe.

Nastenka ev bi dengekî mulahîm gotibû. Lê ew mîna dengekî derizî ku rîtma muzîkê xerab dikir, mêjiyê fi-

58

kreke veşartî û jar tevlihev dikir, bû.

Wê peyva xwe domand:

- Tu dizanî tu ê sibehê çi bikî? Heta ku ji te tê tu sibehê zû here wir, ger bersivek hatibe, tavilê ji min re bîne. Ji

xwe tu dizanî bê ez li ku rûdinêm.
Nastenka careke din jî navnîşana xwe jê re got. Jê pê ve jî ew ket rewşeke tirsê û şelafî bû. Mirov digot qey ew bi dîqet li min guhdarî dike, lê ez nizanim bê çawan bû; min pirsek ji wê pirsî bû, wê bersiva min neda, wê xwe şaş kir û serê xwe bi aliyekî ve xwar kir. Ez lê zîvirîm û min li rûyê wê nihêrî; tam mîna ku ez fikirîbûm, ew digiriya.
- E, ev çi ye? Wele tu hê mîna zarokan î!... Heydê, vî giriyê xwe bibire!
Nastenka hewl da ku bibişire û bêdeng bibe, lê çenga wê dilerizî, sînga wê radibû û dadiket. Piştî ku demekê bêdeng ma:
- Ez li te difikirim, divê mirov kevir be, ku nizanibe bê tu mirovekî çiqas qenc î. Tu dizanî bê çi hate bîra min? Min hûn dane ber hev. Çima ew ne tu yî? Çima ew li te neçûye... Digel ku ez bêtir ji wî hez dikim, lê tu ji wî çêtir î.
Min bersiv neda, Mîna ku wê dixwest ez tiştekî bibêjim.
- Belkî min ew baş fêhm nekiribe, belkî ez wî baş nas nakim. Çi ecêb e, ez hebekî ji wî ditirsiyam; ew sergiran û bi gurûr dixuya. Bêşik, digel ku ew wilo dixuya jî, dilê wî ji yê min teniktir bû. Gava min rahişt buxçuka xwe û ez çûme oda wî, ez di heyatê de wan nêrînên wî ji bîr nakim. Dîsan jî li hemberî wî hurmeteke min ya mezin heye. Gelo ma ev ji bo ku ez xwe kêmî wî dibînim e?

- Ne wilo ye, Nastenka, tu şaş î. Ji ber ku tu wî li dinyayê ji her tiştî, heta ji xwe bêtir hez dikî, ji te re wilo tê.
- Baş e, bila wilo be, Nastenka bi dilpakî got. Binêre, niha tiştek hate hişê min: Em êdî hew behsa wî dikin. Baştir e em li ser tiştin din bipeyivin. Tiştek heye ku ji mêj ve serê min tev dide. Ji bo çi mirov li hemberî bi durustî tevnagere? Ji bo çi mirovên herî baş jî tiştinan ji yê li hemberî xwe vedişêre, hemû tiştê ku ew difikire nabêje? Çima em rastiya tiştên ku di hundurê me de derbas dibin, nabêjin? Çawa be her kes dixwaze ji rastiya xwe serttir be. Gava ew hîsên xwe biavêjin navê, ew ditirsin ku ew ê di bin de bimînin, ew ê biçûk bikevin. Ji ber ku min jî di wê navê de, ji her car bêtir hîsên xwe bindest hiştin, min peyva wê birî:
- Tu rast dibêjî, Nastenka. Lê sedemên vê yên pirtexlît hene.
Nastenka pir bi heyecan bû:
- Lê her kes ne wilo ye! Wek mînak, tu...Tu naşibî kesekî din. Ez nizanim çilo ji te re behs bikim... Bi min wilo tê ku, tu... Nihajî...Tu hin tiştan ji bo min ji xwe dkfi...
Nastenka di bin çavan re bi tirs li min nihêrî û peyva xwe domand:
- Ji bo ku ez wilo dipeyivim li qusûra min nenihêre. Ez keçikeke nexwendî me, zêde neketime nava mirovan. Ji ber vê yekê ez carinan nizanim bipeyivim jî.
Dengê wê ji ber îhtiraseke bi dizî dilerizî, lê dîsan jî

wê hewl da ku ew bibişire.
- Tiştê ez dixwazim bibêjim ev e, ji bo wan hîsên ku tu li hemberî min hildigirî, ez spasdarê te me... Xwedê
60
dilşahiyê bide te! Tiştên ku te do di derheqa xeyalperestiya xwe de gotibûn, yek ji wan jî ne rast e.Yanî têkiliyên van gotinan zêde bi te tune ne. Tu dikarî ji xeyalan rizgar bibî. Tu ne mîna wî mirovê ku te wê rojê behsa kiribû.Tu ê rqjekê hez bikî, hêvîdar im tu ê bi hezkiriya xwe re dilşa bî. Tu xwestekên min yên wilo ji bo wê keçikê tune ne, ji ber ku çawa be, ew ê bi te re dilşa bijî. Ez vê yekê bi zanebûn dibêjim, ez jî jinek im, wê çaxê tu baweriya xwe bi gotinên min bîne. . .
Nastenka haş bû, destê min bi hêz guvaşt. Ez ji heyecanan nikarîbûm bipeyiviyama. Çend deqîqe wilo derbas bûn. Wê, paşê serê xwe rakir:
- Erê, gorî ku dixuye ew ê îro neyê! Pir dereng bûye.
Bi dengekî bi bawerî û bi biryar:
- Ew ê sibehê were, min got.
Rûyê Nastenka şên bû.
- Erê, êdî ez jî mîna te difikirim; ancax ew bikaribe sibehê were. Eh, di xweşiyê de bimîne! Em ê sibehê hevdu bibînin. Ger baran bibare, dibe ku ez neyêm. Lê roja piştî wê, çi dibe bila bibe, ez ê ji sedî sed werim. Tu jî nebêje ez nayêiri. Pir tiştên ku ez ji te re behs bikim hene.
Wê çavên xwe yên rohnî berdan çavên min û destê xwe dirêjî min kirin.

- Em ê êdî her tim bi hev re bin, ne wilo?
Ax, Nastenka, ger te niha bizanîba bê ez çi tenêtiyê hîs dikim!
Gava saet bû neh, êdî ez nikarîbûm di odeya xwe de rawestiyama. Bêî ku ez guh bidim nexweşbûna hewayê, ez derketim kuçê. Piştî kurtedemekê ez li ser textebendê me rûniştibûm. Carekê min got ez herim mala Nastenka, lê gava ez ketim kuçeya wan û bi tenê çend
61
gav mabûn ku ez bigihîştama mala wan, min şerm kir, bêî ku ez serê xwe rakim, ez dîsana berepaş vegeriyam. Gava ez vegeriyam malê, bêhntengiyeke ku min heta niha netamandibû, dilê min dagirtibû. Digel vê jî rewa û mirûziya hewayê hebû. Qet nebe, hewa xweş bûya, min ê dema xwe bi gerê derbas bikira, ez venedigeriyam malê.
Ez çi bikim, ez ê li hêviya sibehê bimînim. Wê Nastenka sibehê behsa her tiştî, her tiştî bike.
Lê name? îro name jî tune bû! Lê çi lazim e? Êdî ew gihîştine hev.
62
Şeva Çaremîn
Xwedêyo, ma wê her tişt wilo dawî bihata, ma wê dawî wilo bibûya?
Ez saet di nehan de hatim. Nastenka li wir bû. Gava min ji dûr ve lê nihêrî, rawestandina wê ya roja pêşî hate bîra min. Wê dîsan wilo xwe spartibû hesinê pirê. Digel ku ez baş nêzîkî wê bûm jî wê ez ferq nekirim.

Min hemû hêz û heyecana xwe nîşan da:
- Nastenka!
Ew bi carekê ve li min zîvirî:
- Ka bide! Tu çi sekinî yî?
Min bi matmayî li wê nihêrî.
- Kanî? Name li ku ye? Ma te name neaniye?
Ez şaşmayî mabûm.
- Name bi min re nîn e!... min gotê. Ma we hê hevdu nedîtiye?
Rû pê ve nema; çavên wê li min bû û di cihê xwe de sar ma. Hêviya wê ya dawî jî min şikandibû. Dawî bi dengekî qurmiçî:
- Eh, ma em çi bikin? Tiştekî ku em bikin tune ye.
Dêmeg wî rûyê xwe ji min bada ye. Wê çavên xwe bera jêr dan, paşê xwest li min binihêre, lê nikarîbû.
63
Herçiqas wê xwest di wan çend deqîqeyan de zora heyecana xwe bibe jî, dawiyê debar nekir, berê xwe guhert, xwe sparte şîşên pirê û bi îskînî giriya.
- Dev ji vî giriyê xwe berde, min gotê.
Lê gava min li rûyê keçikê nihêrî, min fêhm kir ku ez ê nikaribim peyva xwe bidomînim. Ma min dikarîbû ji wê re bigota çi!
Ew bêî rawestan digiriya.
- Min mexapîne! careke din behsa wî meke!
Wî ez bi bêwijdanî û bêînsafî hiştime. Tu jî vê yeka han nabînî û tu hê jî dibêjî, ew ê vegere! Lê çima? Wî çima wilo kir? Gelo ma di nameya min de, di nameya

min a bêyom de tiştekî xerab hebû?
Ji ber îskîna wê peyva wê dihate birîn. Gava min li
wê dinihêrî, dilê min perçe dibû.
- Ew çiqas bêwijdan û xedar e. Wî rêzek jî, bi tenê
rêzekjî ji min re nenivîsand. Çi dibe, bila bi rêzekê du
rêzan bidaya xuyakirin ku ew ji min hez nake, ew min
naxwaze. Lê ev sê rqj in xeber ji wî tune ye. Xuya ye ji bo
wî gelek hêsan e, ku ew keçikeke bêsûc, ku tenê ji wî
hez dike, biçûk bixîne, wê biqeherîne. Bi tenê Xwedê
dizane ku ev sê roj in, bê ez çi dikişînim. Gava ez difikirim,
ku ez bi lingên xwe çûme ba wî, bêî ku ez guh
bidim biçûkdîtina xwe, ji bo ku ez hebekî bê me hezkirin,
gava ez li wan hîsên ku min rijandine difikirim,
ez qehir dibim. Ev e, tu rewşa min dibînî. . .
Nastenka bi carekê ve berê xwe bi min vekir. Ji
çavên wê yên reş birûsk pêdiket.
- Tiştê wilo nabe! Tiştê wilo di dinyayê de nabe. Ev
rewşeke ecêb e! Ya ez şaş im, yan jî tu. Dibe ku jî
nameya min negihîştibe wî, ne wilo? Belkî haya wî ji
tu tiştî tune ye. Çi dibe, tiştekî bibêje, ger tu tiştekî ji vê
64
fêhm dikî ji min re bibêje. Çawa dibe ku ew dikare
evqasî hov û bêwijdan be? Wî gotinek jî nenivîsand.
Yek li hemberî mirovên herî neqenc jî wilo tevnagere.
Gelo di derheqa min de tiştekî ne li rê bihîstiye? Belkî
hinan ji wî re paşgotiniya min kiribin. Bibêje, tu di
derheqa vê de çi difikirî?
- Guh bide min Nastenka, ez ê li ser navê te sibehê

herim ba wî.
-Paşê?
- Ez ê rewşa wî hîn bibim. Ez ê jê re behsa her tiştî bikim
- Wekî din?
- Tu niha nameyekê binivîsîne. Nebêje nabe, Nastenka. Tu bi a min bike. Tu ê bibînî ku ew ê bi hurmetgirî xwesteka te qebûl bike. Ger. . .
Nastenka bi carekê ve peyva min birî:
- Na dostê min, çênabe. Êdî bes e. Ji niha û pê ve êdî ez gotinekê, ez rêzekê jî jê re nanivîsînim! Ez êdî wî nas nakim, ez ji wî hez nakim... Ez ê wî ji bîr bikim!
Min ew li ser bankê da rûniştandin:
- Ewqasî li ber nekeve, min gotê. Li vir rûnê.
- Tiştekî ku ez li ber bikevim tune ye, bes e êdî. Tu guh mede giriyê min, wê derbas bibe! Ma qey tu difikirî ku ez tiştekî bi xwe bikim, ez xwe bikujim?
Dilê min bi wê şewitî. Min dixwest ez bipeyivim, lê min nikarîbû.
Nastenka bi milê min girt:
- Guh bide min, ger tu bûya te wilo nedikir, ne wilo? Keçika ku bihata ber lingên te, te ew wilo nedihişt, ne wilo? Te qeşmeriyên xwe bi dilê wê yê jar û dêhnik nedikir. Ji ber ku ew keçikek ku bi xwe nikarîbû û nikarîbû
65
xwe biparasta û ku te bidîta ew nikare zora dilê xwe bibe, wê gunehê te bi vê keçika bêsûc bihata, ne wilo? Oh, Xwedêyo! Ev çi ye hatiye serê min!

Ji ber ku min nikarîbû ez hê bêtir zora heyecana xwe bibim:
- Nastenka, Nastenka! min bang kirîyê. Tu îşkencê bi min dikî! Tu dilê min perçe dikî, tu ezabê mirinê bi min didî kişandin! Ez êdî nikarim her tiştî biavêjim hundurê xwe. Ger ez li ser tiştên ku di hundurê min de gihane ser hev nepeyivim, ez debar nakim.
Piştî ku min ev gotin, ez rabûm ser xwe. Nastenka bi destê min girt û bi şaşmayî li rûyê min nihêrî:
- Çi bi te hatiye? wê got.
- Guh bide min Nastenka! Tiştê ez ji te re dibêjim, dikare gotinên çewt û ne li rê bin. Digel ku ez dizanim wê tiştekî wilo nebe jî, dîsan ku ez nepeyivim, ez xwe nagirim. Ji bo xatirê yê ku tu di riya wî de êşê dikişînî, liminbibûre!...
Nastenka lawija (dûrika) xwe birî. Di çavên wê yên matmayî de ku berdabûn çavên min, biriqandineke ecêb ya meraqê hebû.
- Ew tiştê ku tu ê bibêjî çi ye?
- Tiştekî ku wê nebe, lê, ez ji te hez dikim Nastenka! Hemû ev bû! Ka em binêrin bê ji niha û pê ve tu ê wekî berê bi min re bipeyivî û li min guhdarî bikî an na?
Nastenka peyva min birî:
- Çi bû ye ku? Ma çi di vê de heye? Min ji mêj ve dizanîbû ku tu ji min hez dikî, lê ne evqasî, min texmîn dikir ku tu hindikî ji min hez dikî... Dêmek ne wilo ye!
- Di destpêkê de jî wilo bû Nastenka! Lê belê niha,

niha... Ez jî niha, mîna gava tu bi buxçika xwe çûbûyî
66
ba wî me... Heta hê jî xerabtir, Nastenka. Ji ber ku yeke
ku wîjê hez dikir tune bû, lê yê te heye.
- Tu çi dibêjî? Ez tênagihîjim bê tu dixwazî çi bibêjî.
Tu çima wilo, hem jî ji nişka ve... Xwedêyo! Ez ji
ehmeqî diaxivim, lê tu...
Nastenka şaş û ecêbmayî mabû. Rûyê wê sor bûbû û
çavên xwe berdabûn çavên min.
- Ez niha çi bikim? Tu bibêje! Ez dizanim ku ez sûcdar
im. Min baweriya te bi xerabî bi kar anî... Lê na, Nastenka,
ez ne sûcdar im. Dengek ji nava min wilo dibêje,
ez hîs dikim, ku ez rast im. Ji ber ku ez nikarim te bi tu
celebî biqeherînim, an jî biêşînim. Ez dostê te bûm, ez
dîsan dostê te me. Tiştekî ku hatiye guhertin tune ye.
Ev e, binihêre, Nastenka, hêsirên min diherikin.
Bihêle bila biherikin, ma zerara wê digihîje kesî?
Çawa be ew ê ziwa bibe. . .
Wê hewl dida ku ew min li ser bankê bide
rûniştandin.
- Rûnê canê min, rûnê, tu bala xwe bide vî îşî!
- Na. Nastenka, ez ê rûnenêm. Ez êdî nikarim li vir
bimînim. Tu ê ji niha û pê ve hew min bibînî. Tiştên ku
ez dixwazim ez ê bibêjim û ez ê paşê herim. Gotina min
ev e, Te ê tu caran fêhm nekira ku ez ji te hez dikim.
Min ê sirra xwe ji xwe re veşarta. Diviya bû min di
demeke wilo de tu bi ezîtiya xwe xemgîn nekiriba. Lê ji
ber ku te mijar vekir, sûc ne yê min e, yê te ye... Mafê te

tune bû ku te ez ji ba xwe biqewirandima. . .
Heta ku ji Nastenka dihat wê dixwest ku şerma xwe veşêre:
- Kê tu qewirandiye? got. Ez te naqewrînim ku!
- Dêmek tu min naqewirînî? Ji xwe ez ê bi xwe biçûma... Ez ê dîsan jî nesekinim. Ez dixwazim pêşî
67
hundurê xwe vala bikim. Berî bi kêliyekê tu digiriya, te bi dilşewatî gazin dikir. Ji ber ku... Ji ber ku (ez ê vekirî bibêjim) wî evîna te red kir, wî tu bi tenê hişt. Min nikarîbû ev qebûl bikira Nastenka, Dilê min li hemberî te bi hezkirineke wilo mezin tijî bû, ku ez nikarîbûm li cihê xwe bêdeng rûniştama. Lê gava min didît ku ev hezkirina min jî bi kêrî tiştekî nayê, ez xemgîn dibûm. Ma di vê rewşê de ku ez nepeyivim, çêdibe, Nastenka? Min debar nekir, min her tişt got. Di rûyê Nastenkayê de liveke armanc nediyar hebû.
- Bila be, bibêje. her tiştî bibêje. Wê ev xwesteka min bi te ecêb were... Dîsan jî bibêje, bipeyive. Ez ê paşê ji te re bibêjim, bê ezji bo çi wilo dixwazim. Ez ê ji te re her tiştî bibêjim.
- Gunehê te bi min tê Nastenka. Gelo ma ji bilî vê tiştekî ku tu bixwazî bibêjî heye? Tiştên çûne çûne, tiştên hatine gotin hatine gotin; gotinên ku ji dev derdikevin bi paş ve venagerin. Ji ber ku tu êdî bi her tiştî dizanî, em ê ji vir dest pê bikin. Gava tu berî niha bi demekê digiriyayî, ez xwe bi xwe difikirîm ku... Erê, min çi digot. Ha, ez xwe bi xwe difikirîm ku... Ne tiştekî

ku her dem dibe ya... Ez fikirîm ku ji ber hin sedeman tu dikarî ji wî hez nekî. Ez do jî li vê yeka han fikirîm, îro jî, Nastenka. Ji ber vê yekê min çi bikira jî, diviya bû min xwe bi te bidaya hezkirin. Ji ber ku te bi devê xwe got ku, te êdî dest pê kiriye û ji min hez dikî. Ev e, tiştên ku min dixwestin ez bibêjim, kêm zêde ev in. Ha, tiştekî din jî heye: Ez dixwazim vê jî bibêjim; ger te ji min hez bikira, me ê çi bikira. Li min guhdarî bike, dosta min - ji ber ku tu hê jî dosta min î - ez mirovekî basît, belengaz û reben im. Di eslê xwe de ya girîng ne ev e. Ji ber ku min xwe şaş kiriye ez van gotinan di devê
68
xwe de dibim û tînim. Çawa be, em dev ji van berdin. Tiştê ez dixwazim bibêjim ev e, ger tu ji vî peyayê ku ez nas nakim, hez bikî, ger tu hezkirina xwe bidomînî, ez ê dîsan mîna dêhnan ji te hez bikim, lê ji bo ku hezkirina min ji te re nebe bar, tiştê ku ji destê min bê ez ê bikim. Te ê bi tenê ev fêhm bikira û bizanîba ku; her tim li ba te dilekî ku ji bo te lêdixe, tijî minet û germ, heye. Hem dilekî wilo ye ku... Ax, Nastenka, Nastenka!. . . Te ez xistime çi rewşê!. . .

Nastenka ji ser bank hol bû,

- Megiri, ez naxwazim ku tu bigirî, got. Heydê, em ji xwe re hebekî bimeşin. Giriyê xwe bibire êdî.

Wê destmala xwe derxistibû û hêsirên xwe pakij dikir.

- Baş e, em niha dikarin herin. Belkî tiştekî ku ez jî ji te re bibêjim heye. (Ez qet naxwazim te bixapînim)

digel ku ez hê jî ji wî hez dikim, mafir wî dev ji min berdaye, wî ez ji bîr kirime... Erê, mafir... Çîk... bersiv bide min: Em bibêjin ku min jîji te hez bikira, bi tenê ji te... Ax dosto! Ez niha fêhm dikim, ji bo ku tu ne dildarê min bû, min tu diêşand, min henekê xwe bi te dikir. Ax, ez çi bêaqil bûme. Çawan ez nikarîbûm bifikiriyama, çawan min nikarîbû texmîn bikira! Min êdî biryara xwe daye, ez ê her tiştî bibêjim. . .

- Li min guhdarî bike, Nastenka! Çi dibe, ez herîm. Ji ber ku ez bi tenê êşê didime te. Binihêr, ji bo ku te tinazên xwe bi min kirine, tu niha ezabê wijdan dikişînî. Lê ez tiştekî wilo naxwazim, ev hemû sûcê min e, Nastenka. De, di xweşiyê de bimîne.

- Ka raweste, li min guhdarî bike! Ma tu nikarî hebekî rawestî?

- Ez ê li benda kê, ji bo çi rawestim?

69

- Ez ji wî hez dikim, lê ev ê derbas bibe, divê derbas bibe, derbasnebûna wê ne mumkun e. Niha jî ez hîs dikim ku derbas bûye... Dibe ku îro dawî were. Tu dizanî çima? ji ber ku ez ji wî nefret dikim, gava tu li vir, li ba min digirî, wî tinazê xwe bi min dikir. Paşê te, mîna wî ez bi tena serê xwe nehiştime. Ji ber ku tu ji min hez dikî, lê ew nizane bê hezkirin çi ye. Ez jî, ji te hez dikim. Hem jî bi qasî ku tu ji min hez dikî... Min berê jî ji te re gotibû, ji ber ku tu ji wî çêtir û bi esiltir î ez ji te hez dikim. Ji ber ku ew. . .

Heyecana keçika reben gihîştibû dereceya dawî. Berî

ku ew peyva xwe biqedîne, wê serê xwe danî ser milê min, paşê jî danî ser sînga min; bi dilşewatî giriya. Tiştên ku min ji bo aşkirin û rawestandina giriyê wê gotin, hemû jî bertelaf çûn, giriyê wê qet nedisekinî. Wê bêî navbir destê min dişidand, di nava îskînên xwe de car bi car dipeyivî.

- Hebekî raweste, wê niha derbas bibe. Ez ê tiştekî ji te re bibêjim, nebêje qey ev hêsir ji ber tiştekî din e... Ji hesasiyetê ye. Ew ê niha raweste.

Dawiyê giriyê wê sekinî, wê çavên xwe pak kirin û em dîsan meşiyan. Min dixwest ez bipeyivim, lê her carê Nastenka lava dikir ku ez hebekî din jî rawestim. Em bêdeng dimeşiyan. . . Dawî dawî ew bi ser xwe ve hat û dest bi peyvê kir. Dengê wê yê jar û lerzokî pir tesîr li min kir û dilê min êşand.

- Çi dibe, tu min mîna keçikeke sivik nebîne. Ez ne ji wan kesên ku zû ji bîr dikin û xiyanetê dikin. Min tam salekê ji wî hez kiriye, ez bi navê Xwedê sond dixwim ku xapandina wî rojekê jî di serê min re derbas nebûye. Lê tişt nabe, wî ez bêqîmet dîtim û henekê xwe bi min kir, Xwedê qusûra wî efû bike. Bi êşandina min.

70

bi şikandina dilê min çi fêda wî çêbû? Hîç!...Ez êdî ji wî hez nakim. Ez ancax bikaribim ji yekî dilberz û bi esil hez bikim. Ji ber ku ez jî wilo me, ew ne layiqî min e. Xwedê kêmasiyên wî efû bike. Ji berdêla ku ez ê bi derengî bi xapandina xwe bihesim, wilo çêtir e. Ez êdî wî nas dikim. Êdî dawiya hemû tiştî hatiye...

Nastenka destê min şidand û dom kir:
- Paşê, tiştekî din jî heye, dostê min. Dibe ku evîna min ya li hemberî wî ji xapandineke hîsî û ji xeyalan pê ve ne tiştekî din be. Belkî ji aciziyeke ku ez ji ber çongên pîrka xwe neqetyabim be. Diviya bû peyayê ku min jê hez bikira cihê bûya. Erê, diviya bû min ji yekî ku gunehê wî bi min bihata hez bikira... de em vê mijarê bigirin.
Nastenkaya ku kirî ji heyecanan bifetisiya, hebekî sekinî.
- Binêre, tiştê ku ez dixwazim ji te re bibêjim ev e: Digel ku tu dizanî ez ji wî hez dikim - min bi rastî jê hez kiriye - ger tu hê jîji min hez dikî... Ez çawa bibêjim, ger tu hîs dikî ku evîna me gelekî bi hêz e, bi qasî ku bikaribe yê din ji dilê min bi dûr bixe... Ger wê gunehê te bi min were û tu ê nehêlî ku ez di jiyanê de bi tik û tenê, bêhêvî, bêaşkirin û bi qedera xwe re bi tenê bimînim... Ger tu ê her dem mîna niha ji min hez bikî, bi soz ez spasdar im... Çîk... wê evîna min layiqî evîna te be. Tu destê min dixwazî?
Min nikarîbû hêsirên çavên xwe yên dilşahiyê bigirtana.
- Nastenka! Ax, Nastenka! min bi qêrîn got.
Wê jî bi zorê xwe digirt.
- Eh, ewqas bes e! Ez bawer im her tiştên ku wê bihata gotin, hatin gotin. Em herdu jî dilşa ne, ne wilo? Wê
71
çaxê em vê mijarê bigirin, em behsa tiştin din bikin.
- Erê, Nastenka, wilo ye. Bila ev mijar bête girtin. Ez

pir dilşa me. Ger êdî em derbasî mijarin din bibin wê baş bibe. Ê min ez hazir im.
Lê me nizanîbû bê em ê li ser çi bipeyiviyana. Em dikeniyan, digiriyan, me henek û qeşmeriyên bêhawe dikirin. Cama em di ber dikanan re dimeşiyan, cama jî em derbasî hember dibûn û li wir digeriyan, paşê em dîsan vedigeriyan cihê xwe yê kevin û em ji xwe re dimeşiyan. Em mîna zarokan dilşa bûn...
- Ez niha bi tena xwe me, Nastenka, lê di pêş de... Tu dizanî, ku ez mirovekî xwedî hatineke kêm im. Salê hezar û du sed mble dikevin destê min, lê ne xerab e.
- Ji xwe ne xerab e. Paşê hatina pîrka min ya jinebîtiyê jî heye. Ew ji me re nabe bar. Em ê wê bibin baxwe.
- Ji xwe em ê wê bibin ba xwe. Ma em wê nebin dibe! Lê ev Matriyona me. . .
- Erê, a me jî Fiyolka me heye...
- Matriyona jineke baş e. Kêmasiyeke wê heye, ew jî serê wê vikî vala ye, hişê wê nagihîje tiştekî. Lê ev ne girînge...
- Çi ferq dike canê min! Ev nabe sedema ku ew li hev nekin. Divê hûn sibehê tavilê bar bikin ba me.
- Çawa, em ê çawa bar bikin ba we?... Ji bo min ferq nake...
- Erê, hûn ê bibin kirêdarê me. Odeya jor vala ye. Pîrejineke esilzade lê dima. Ez dizanim ku pîrka min kirêdarekî ciwan dixwaze. Min jê pirsî "Tu ji bo çi yekî ciwan dixwazî?" "Ji ber ku ez pîr bûme, tu nefikire ku

ez ji te re li mêran digerim" wê li min vegerandibû. Lê ez tavilê têgihîştim ku ji bo vê yekê ye.
72
- Ax, tu heye ya!
Em herdu jî keniyan
- Eh, temam! Kenê me bes e!... Tu li ku rûdinişt? Min ji bîr kir.
- Li ba pîra Xê, di xaniyê Barannikov de.
- Maleke wilo mezin e?
- Erê, mezin e.
- Ez dizanim, ew maleke xweş e. Êdî hûn dev ji wir berdin û rojekê berî rojekê bar bikin xaniyê me.
- Derengtir sibehê, Nastenka. Ez hebekî deyndarê kirê me, lê xem nake... Çawa be ez ê di nêzîk de mehiya xwe bistînim.
- Belkî ez jî dersan bidim. Ez ê pêşî hîn bibim, paşê jî hînî hinin din bikim.
- Pir baş e, Nastenka. Tu dizanî, ez ê di nêzîk de îkramiyê bistînim.
- Dêmek tu ê ji sibehê û pê ve bibî kirêdarê min.
- Erê. Binêr, ew ê Berberê Sevîlayê dîsan bileyize, em dikarin bi hev re herin bibînin.
Nastenka keniya.
- Em ê herin, lê ne Berberê Sevîlayê, em herin tiştekî din bibînin.
- Baş e, tiştekî din. . . Bêşik wilo çêtir e, bêî ku ez zêde lê bifikirim min ew got.
Em ji xwe re wilo dipeyivîn û dimeşiyan. Te digot qey

em ji xwe çûbûn, me ferq nedikir ku em li ku dimeşiyan jî. Em cama disekinîn, em li eynî cihî demeke dirêj dipeyivîn, paşê em dîsan dimeşiyan, em têê diçûn cihên dûr, em di nava hêsirên çavan de bi hîke hîk dikeniyan.

Nastenka carna dixwest here malê, ez jî ji wê re nedibûm asteng, min ew dibir heta ber mala wê. lê piştî

73

çarîkekê me dîsan dinihêrî ku em li rihtima xwe, li ser bankê xwe ne. Cama jî gava Nastenka bêhna xwe berdida, çavên wê tijî hêsir dibûn. Wê çaxê tirsekê ez digirtim, ez dibûm mîna qeşayê. Lê wê tavilê bi destê min digirt û ez dibirim deverên dûr. Me wilo dîsan dest bi henek û qeşmeriyan dikir û em digeriyan.

Dawî Nastenka;

- Em êdî herine malê, got. Dem dereng e. Evqas şeytaniyên ku me kirin bes e.
- Tu rast dibêjî Nastenka. Lê ez êdî hew dikarim razêm. Ez naçim malê.
- Ez bawer im ez ê jî nikarim razêm. Dîsan jî tu min bigihîne malê.
- Ez ê te bi kêfxweşî bigihînim malê!
- Lê em ê vê carê bi rastî herine mal.
- Tu qet meraqan meke.
- Bi soz? Ji ber ku çawa be ez ê herime mal.

Bi ken,

- Bi soz, min gotê.
- Wê çaxê heydê.

- Baş e... Li esmên binihêre Nastenka. Wê sibehê roj gelekî xweş be, wê asman çiksayî be, wê heyv şewq bide. Tu bala xwe bide vî ewrê zer, tu nemaye ku ew heyvê bigire. Binihêr, binihêr... Lê di rex wê re derbas bû... Tu dibînî, Nastenka?
Lê Nastenka li heyvê nedinihêrî. Ew nedipeyivî, mîna kevirekî li ba min sekinî bû. Piştî demekê, ew bi tevgereke bi tirs û bi guman nêzîkî min bû. Destê wê yê di nava destên min de bû, lerizî. Wê hê bêtir xwe sparte min.
Di wê navê de, di ber me re peyayekî ciwan derbas bû. Gava ew hate rasta me, bi carekê ve sekinî, bi dîqet li
74
rûyê me nihêrî, paşê dîsan çend gavan meşiya. Dilê min wilo lêdixist ku te digot wextî ew ji sînga min bipengize der.
Bi hêdîka,
- Ev peya kî ye, Nastenka? min jê pirsî.
Ew baş nêzîkî min bûbû, mîna hêlkanê dihejiya.
- Ew e. . . di ber xwe de got.
Ez bi zorê li ser lingên xwe radiwestiyam.
Ji pişt me dengê
- Nastenka! Tu yî, Nastenka? hate bihîstin.
Di eynî demê de ew xort bi çend gavan nêzîkî me bû. Ew çi qêrîn bû Xwedêyo!... Û lerizîna Nastenka, ji milê min derketin û ber bi mêrik ve bazdana wê! Ez di cihê xwe de şaş mabûm, min li wan dinihêrî. Lê xweavêtina Nastenka ya stûyê mêrik û ber bi min ve

vegera wê bû yek. Ez hê berî ku têbigihîjim bê çi dibe, min carekê nihêrî ku milên Nastenka di stûyê min de ne, bi germî û ji dil min maçî dike. Lê paşê bêî ku gotinekê jî bibêje, ber bi yê din ve baz da, bi destê wî girt û ew bi dû xwe de kişand.
Ez di cihê xwe ve sar mam û min li wan nihêrî.
Dawiyê herdu jî ji ber çavan winda bûn.
Sibeh
Şevên min wê sibehê tewaw bûn. Rqjeke berbat bû. Baranê bi tipîniyên bi keder li camên pencereyên min dixist. Odeya min tarî bû, li derve hewayeke bi mij hebû. Serê min yê ku ji êşê perçivî bû, gêj dibû. Hemû laşê min bûbû mîna êgir.
Min di navbirekê de li ser serê xwe dengê Matriyonayê bihîst.
- Nameger ji te re nameyek aniye, mîrza.
-Name?... Jikê?
Ez ji heyecanê pekiyabûm ser lingan.
- Ez nizanim, beg. Ka tu li hundurê wê binihêre, dibe ku tê de nivîsî be.
Min zerf vekir. Ji wê bû.
" Li min bibuhure" digot, " ez têm lingên te tu ê li min bibuhurî. Min hem tu, hem jî xwe xapand. Ev xeyalek bû, xewnerojkek bû. Gava ez îro li te fikirîm, dilê min perçe bû. Li min bibuhure"
" Çi dibe. min sûcdar meke. Ji ber ku ez li hemberî te qet nehatime guhertin. Min ji te re gotibû, ez ji te hez

dikim. Ez ji te hez dikim û ez hîseke ji hezkirinê jî
wêdetir di dilê xwe de hildigirim. Xwedêyo! Ku ji destê
min bihata û min bikarîba ji we herduyan bi hev re hez
bikira. . . Ma wê çi bibûya, ger tu ew bûya!"
(Ax Nastenka, ma ez qet dikarim van gotinên te ji bîr
bikim?)
" Ma min niha nedixwest ku ez ji bo te çi nekim! ez dizanim
bê tu di çi rewşê de yî, tu çiqasî li ber dikevî. Min
tu şikand. Lê tu dizanî, dilê ku hez dike, şikandina xwe
zû ji bîr dike. Tu jîji min hez dikî. Spas dikim. Ji bo ku
te ji min hez kiriye ez spasdarê te me. Ji ber ku ev hezkirina
han ji min re mîna gava mirov ji xewneke xweş
şiyar dibe û demeke dirêj xweşiya wê xewnê ji bîr nake,
di dilê min de cih girtiye. Ji bo ku te ji min re dilê xwe
bi biratî vekiriye; te mezinahiya ku tu dilê min ê
birîndar û xemgîn qenc bikî û biparêzî nîşanî min da.
Lêborîna te, bîranîna bi te re di dilê min de bilindtir
dike. Ta ku ez li jiyanê bim, ez ê bîranîna bi te re di dilê
xwe de bidim jiyandin. Ez ê wê biparêzim û pê ve
girêdayî bimînim. Ew ê tu îxanetê ji min nebîne. Ji ber
ku ez îxanetê bi xwe nakim. Te dît, ev dilê ku hê do aydî
yekî din bû, ji nişka ve çawan hate guhertin.
Ez ê bixwazim te bibînim; tu ê min terk nekî, tu ê
werî. Tu ê her tim bibî hevalê min, birayê min... Gava
em hevdu bibînin tu ê destê xwe bidî min, ne wilo? Tu ê
destê xwe bidî min û tu ê ji min re bibêjî ku te ez efû
kirime. Ma tu hê jî mîna berê ji min hez dikî?
Ax, çi dibe, ji min hez bike, min ji bîr meke. Tu pê

nizanî bê ez niha çiqasî ji te hez dikim, dostê min ê
delal!
Ez ê hefteya pêşiya me bi wî re bizewicim. Gava ew vegeriyabû,
wî hê jî ji min hez dikir, wî qet ez ji bîr neki-
77
ribûm.
Bibuhure ku min di nameya xwe de behsa wî kiriye.
Ez dixwazim bi wî re werim seredana te. Tu ê ji wî hez
bikî, ne wilo?
Li min bibuhure, ji bîr meke û hez bike."
Min name careke din û careke din xwend. Çavên min
tijî hêsir bûbûn. Dawî dawî name ji destê min ket, min
rûyê xwe bi destan nuxumand.
Dîsan dengê Matriyonayê hate bihîstin:
- Ez dixwazim ji te re tiştekî bibêjim, beg!
- Ka bibêje, dayê.
- Min ew tevnepîrikên li zikê odeyê hemû pak kirin.
Tu vê firsendê nerevîne, an bizewice, an bangî hevalên
xwe bike; tiştekî bike...
Min li Matriyonayê mêze kir. Ez nizanim ji ber çi bû,
lê ew pîrejina ku hê li ser xwe bû û ciwan bû, di wê
kêlîkê de rûqermiçî, piştxûz, çavçilmisî û pîr xuya
dikir. Odeya min jî eynî mîna xizmetkara min kevne
dixuya. Dîwar û raxistina alavên li hundur reng
avêtibûn. Li her derê tevnepîrik li ba dibûn. Gava min
ji pencerê li derve nihêrî, min dît ku xaniyê li hember
jî hêrifî ye, mîna ku çilmisî ye, seyandina stûnên wî
perçe bi perçe jê de ketiye, xemla stûnan reş bûne û cih

bi cih perçivîne. Ew rengê biriqandî yê dîwaran
nemabû, dîwar gewr bûbûn.
Gelo ma ji bo ku rojê serê xwe di bin ewrên baranê de
nîşan dabû û tavilê winda bûbû, her tişt li ber çavên
min wilo bêreng dixuyan?
An jî gelo ma min pêşeroja xwe ya bi hizin û nexweş
demekê di xeyala xwe de dabû jiyandin, rewşa xwe ya
piştî bi panzdeh salan, dîsan bi tenê, dîsan di eynî
odeyê de, digel ku salên dirêj di ser re derbas bûne,
78
dîsan bi Matriyona ku bi qasî misqalekî biaqil nebûye
re bijîm, min dîtibû?
Lê ji te kîn girtin, Nastenka?... Herimandina
dilşahiya te ya pak û xweş ?... Ma ez qet bi gazin û
lomeyên xwe yên bêtehm te xemgîn dikim û ezabên bi
dizî bi te didime kişandin? Ma ez qet dixwazim ku dilê
te di rqjên te yên herî şa de bi êş lêbikeve? Rqja ku tu
bibî bûk û bi wî mêrîkî re bimeşî, ma ez dikarim gulekê
jî ji wan gulên narîn ku te bi porê xwe yê reş vekirine,
biçilmisînim? Ma ez ê van bikim, Nastenka? Qet, qet!
Bila asmanê te her tim sayî be, bila bişirînên te yên dilovan
şewq û şahiyên xwe winda nekin. Ji dema ku te
şahî daye vî dilê min ê ku bi tena xwe dijî û ji bo te bi
minetkarî lêdixe. ez ê te her bi qencî bi bîr bînim.
Xwedêyo! Ew çi demeke xweş û dirêj bû! Ma qey
demeke wilo ji bo temenê mirovekî têr nake?
79
ŞEVEN SPI

Dostoyevskî
Digel ku ev zêdeyî sed salî ye di ser Dostoyevskî re derbas bûye jî, hê ew bi zewq û heyecan tê xwendin, berhemên wî mîna piyes li ser dik û sehneyên cîhanê bi xurtî têne leyistin, ji aliyê temaşevanan ve bi balkêşî têne temaşekirin.
Sedema ku heta niha Dostoyevskî aktuelbûna xwe parastiye ew e, ku ew ji peyvên pûç û vala, ji gotinên tûj û sloganî dûr, lê bi gotinên tije mane, mîna psîkologekî jîr dadikeve kûraniya ruhuyeta kesan û dibe şirikê rebenî û perîşaniya wan.
Di Şevên Spî de Dostoyevskî perîşanî, şcrpezetî, tenêtî, rebenî û evîna du mirovên dilpak; Nastenkaya hivdeh salî û xortekî bîst û şeş salî, bi hostetî tîne ziman.
Weşanxaneya me pirtûkxaneya kurdî kiriye xwediyê vê berhema hêja.
Bi hêviya ku wê bi dilê we be. . .
**

ŞIVANÊ KURD

LE BERGER KURDE
Ereb Şemo
INSTITUT KURDE DE PARIS
1989
Ereb Şemo
ŞIVANÊ KURD
LE BERGER KURDE
INSTITUT KURDE DE PARIS
DU MÊME AUTEUR /
NEYNL NIVÎSKARÎ
Xo-xo hînbûna xandina nvîsana kurmancî,

(Apprendre soi-même l'écriture kurde),
Erivan, 1929, (bi hevkariya J. Marogûlov).
Emrê Lenîn (La vie de Lênine), Erivan, 1930.
Kara kolxoza gundiya ra (Pour les kolkhozes
paysans), Erivan, 1930.
K voprocu 0 feodalizme u Kurdov,
(Pirsa feodalîzmê li cem Kurdan/De la question du
fêodalisme chez les Kurdes), Erivan, 1958.
Berbang (L'Aube), roman, Erîvan, 1958.
Jiyîna Bextewar (La vie heureuse), roman, Erîvan, 1959.
Berevok (Recueil), Erivan, 1%9.
Dim-dim (forteresse de Dim-dim), roman historique
Moscou,1974

@
Institut Kurde de Paris, 1989

Depôt Legal: decembre 1989
ISBN 2-908416-01-8

ŞIVANÊ KURD
LE BERGER KURDE

VANÊ KURD çîroka jiyana hîmdarê edebiyata Kurdên sovyetî Ereb Şemo ye. Nivîskar di malbateke koçerên kurd de hatiye dinê û di zarotiya xwe de şivantî kiriye. Bilî zimanê dayika xwe, ew di jiyanê de hînî fileyî û tirkî bûye û di dibistana gundê xwe de fêrî nasîneke têrker a xwendin û nivîsandina rûsî jî bûye. Ew hê xort bû gava Şerê ahanî yê Yeka dest pê kir. Bi saya nasîna xwe ya zimanan ew karî di

ordiyên rûs ên ku Kurdistanê dagîr kirin û ketin nav tixûbê Tirkiyê bibe tercuman. Ji ber belengaziya zarotiya xwe ew tiyê bextiyariyeke mestir bû û gava ku Şoreşa 1917 qewimî ewî baweriya xwe bi îdeala komunîst anî.

Di salên Şerê hundir de Şemo wek dilxwaz şer kir û piştî serketina bolşevîkan, bû yek ji sazkerên sereke yên sovyetan li nav eşîrên kurd ; ewî tevî J. Maragûlov di sala 1929 alfabeyeke kurdî bi tîpên latînî çêkir li Ermenistana sovyetî (Piştre, di 1940 de, alfabe kirîlîk a rûsî li Kurdên Sovyetî hate ferz kirin.). Ji sala 1921 ve ew di şerê dijî ''beg, axa û şêxên feodal'' ên kurd de roleke muhîm leyist, lê di dawiyê de liwî jî hate gilî kirin û ew di 1937 de şandin sirgûnê. Piştî 17 salan li kampên Sibiryayê di sala 1954 de bêrîtiya wî hate nasîn û ew vegeriya Rewanê. Ta mirina xwe, di 1978 de, ew li wê derê jiya û xwe da xebata xwe ya edebî.

4

Di Şivanê kurd de Ereb Şemo, bi awayekî gelek xwezayî û sade û ne bê şiîr, bûyerên her roj, jiyana eşîrên kurdên koçer bi me dide nasîn. Mirov ewê nikaribe van nivîsaran bê heyecan û bê eleqe bixwîne, nemaze ji ber ku êdî îro ev orf û adet ên sedsalan di piraniya Kurdisanê de li ber windabûnê ne.

Ev çîrok afirandina navdartir a edebiyata Kurdên sovyetî ye. Navdariya wê ya li nav Kurdan ji bo pareke mezin, ji çapa wê ya ku dostê me yê rehmetî

Nûredîn Zaza di 1947 de li Beyrûtê belav kiribû tê. Ev çapa bi wêne bi nihênî liher aliyên Kurdistanê belav bû û tesîreke mezin kir li ser ciwanên kurd ên xwenda.

Kurdiya vê çapa nû jî bi bingehî ya metnê Dr. Zaza ye, tenê hin kêmasiyên wê hatine temam kirin û ji ber eslê wê hin guhartin tê de hatine kirin. Heçî wergerandina fransizî, ew bi qelema kurdnasê bi nav û deng Bazîl Nîkîtîn, qonsulê kevn ê Rûsya li Wirmê, nivîskarê nemaze kitêba hêja Les Kurdes, etude sociologique et historique, edition K1incksieck, Paris, 1956, hatiye pêk anîn. Nîkîtîn ew di 1946 an de li ber wergerandina rûsî ya ku di sala 1935 de li Tiflîsê ji ber Şivanê Kurmancan (Erîvan, 1935) çap bûbû kiriye zimanê fransizî. Wergrandina Bazîl Nîkitîn ta nihu li tu ciyan derneketibû. U çapa kurdî jî demeke dirêj e ku peyda nedibû. Bi vê çapa du-zimanî ya vê çîroka navdar, em hêvîdar in ku xwendineke dewlemend û balkêş pêşkêşî xwendevanên pircure bikin ; ên ku bi fransizî an kurdî dipeyivin û berî hemiyan, ciwanên kurd ên ku fransizî hîn dibin û fransizîaxêvên ku dixwazin hînî kurdî bibin û kêmasiya metnên du-zimanî dikşînin.

6

BIRA PÊŞÎN

1- Malbat û zarotiya min

Şemo Şamil ji Eşîra Hesenî, Kurdekî bê milk bû. Di menûqeya Sûrmelî de -berê tabiê Hikûmeta

Erîvanê- şivanî dikir. Piştî ko jina wî mir, Şemo her du kurên xwe -Bro û Derwêş- bi xwe re birin ûji wê derê derket.

Di himbêzê de, bi van her du zarokan re bi rê ve çûn, jê re ne hêsanî bû. Bro hîngê sê û Derwêş jî du salî bûn; ji bextê wî yê baş, pêre ji bo hilgirtinê tiştên din tunebûn.

Li nêzîkî Qersê, di gundê yûnanî Azatê de, Şemo licem Yûnanekî bi navê Tôdor bû şivan. Li cem Todor bi navê Mayane, keçeke bêkes hebû. Şemo Şamil xwest vê keçikê ji xwe re bîne. Lê, xadimeke bê dê û bav wek milkê axayê xwe tê hisab kirin. Todor dizanî ku Kurd jinên xwe bi pere tînin, ango qelen didin, ji lewre, ewîji Şemo Şamil xwest ku du salan belaş pezê wî biçêrîne. Şemo careke dî çavên xwe li Mayane gerandin, û ji bo jineke ewqas delal xebata du salan kêm dît û bi dilxweşî razî bû.

8

Di kadînekê de, bi kêfxweşî daweta wan çêbû.

Mayane, xweş bi kêıi'îşên malê dihat Ji hiriyê ıi's dirist a benik çêdikir a jê jî pa1as diwOnandin. Her du xweşkên min - Çîçek û Gulzar - 0 ez Ereb Şemo, em di vê kadînê de hatin dinê. Diya min her du kurên mêrê xwe - Derwêş 0 Bro - diêşandin, lê em zaro me gelekji hev hez dikir.

Şemo di zivistanê de, li cem dewlemendan dibû rencber û li karên wan dinêıi'. Zar û zêçên wî êdî pir

bûbûn. Bi xebatên xwe yên rojê, dê 0 bav, bi zor em xwedî dikirin. Tenûra me di nav kadînê de, di zivistanê de, cama bi rojan ve bê agir dima. Tu dewarê me nebû ku em ji ziblê wan sergîna çêkin 0 tevî kayê tenûra xwe pê germ bikin, ji ber ku li aliyê me dar û devî nebûn.

Pircaran, dadê, li cem xelkê bi rojê kar dikir, bi wan re li hev dihat ku bihêlin em zaro, li axurê an li gova pez rûnin, ji ber ku di zivistanê de ciyê pez û dewar germ dibe. Lê tu xwedî belaş nedihişt em xwe germ bikin. Ji lewre, gava dadê li mala wan dişixu1î emir didane me ku em liber alifên miyan runin û ji sibê heya êvarê, birçî êmên ku ji alifan diketin em wan berhev bikin û dîsa wan deynin cihê wan. Eger em li wê nebiwana, miyan pê li ewqas qOtên giranbiha bikirina.

Gava em hinek serbest diman, xwediyê pez helez datanî ber me ku em ji bo sobeya wî, wî hûr bikin. Êvarê, piştî şixul, bi dadê re, ji tab ketî, bi lez 0 bez em diçûn kadîna xwe ya cemidî.

10

Ji roja ku ez hinek mezin bûn, min xwest ez bibime şivan. Birayên min ji nihû de bi bavo re diçûn çolê wek du şivan û ari'kariya wî dikirin û ewî jî ew hûıî şivantiyê dikirin.

Daxwaza min bi cî bû. Rojekê, serê sibê, bi bav û birayên xwe re ez çûm çolê ber golikan. Wê roja ha, diya me jî bi me re hat da ku pincaran şanî me bide (spînk, tirşo, mendik, pêkesk, hwd ...). Diviya bû, em

şivan, zikê xwe bi nan û pincaran têr bikin. Dadê, heftekê bi me re hate çolê. Piştî ku me ev pincarên ha naskirin, ew êdî nema hat. Her sibê, ewê perçeyek nanê lewaş û hinek xwey bida me da ku em wan bi pincaran bixwin. Birayên min, pincarên ku tên xwarin û ên nayên xwarinji hev nas nedikirin û ew ji min dipirsîn? Diya min pesnê min dida û digo gava ez mezin bibim ezê bibim şivanekî pispor.

Bavê me jî, giyayên ko bi kêiî pez nedihatin şanî me didan. Kîjan giya di pez de kurm pêyda dikin, bi kılana pezên nexweş tên derman kirin, û pez ji guran çawa tê parastin.

Di destpêkê de, me pincar ji bo xwe ber hevdikirin û ew bi nanê xwe dixwarin. Lê, piştre, diya me, hîn giyayên dinji me re dan naskirin, wek: spîdak, gûtik û sîso. Me ew hişk dikirin, ji bo ku zivistanê bixwin. Tûrikek dabû heryekji me û diviyabû em bi xwe reji çolê miqdarek gotî ya pincarê bînin. Diya me ew di-neqandin, ew datanîn ser hev, û baş hişkiiî, ew hiltanîn ji bo rojên zivistanê.

12

Gava em hîn mezintir bûn dadê ji me di zeviyan de peydakirina helezê xwest, me jî her gav bi xwe re hinek jê tanî mal.

Me rêxa hişk jî berhev dikir, bi avê şil dikir û jê sergîn çêdikir. Li ber germiya tavê, tepikên me hişk dibûn, û êvaran me ew bi xwe re dibirin mal. Her yek

ji me, dibiyaba her êvar deh liban jê bîne. Lê, ê min bi xwe, kêfa min ji pîskirina destên min bi ziblê nedihat. Dadê gazina ji min dikir û ez ceza dikirim.

Dê û bav jîji xebata me kêfxweş ban. Vê zivistana ha, tirsa me ji sermê ewqas ne giran bû. Me têra xwe hel ez, pincar û sergîn pêkanîbûn.

Payîzê, nîv tazî, em ji sermê, baran û zîpika gelek diêşiyan. Bê sebir, em li benda ketina berfê bûn ko em neçin çolê.

Sala şivantiya me ya pêşîn bi vî awayî derbas bû. Li mal, nivîna me ji kayê bû. Me ew li erdê radixist û me hesîrekji giyayê nerm çêkirî datanî ser; balgêha me jî ji vî giyayî ba. Li ser xwe jî me merşeke fireh davêt. Em zaro, li cem hev, li ser rêzekê, radizan, û di navbera me de pevçûn bê hesêb bû, heryekî ji me dixwest li nivîn raze, ji ber ku ew der hêj germtir bû. Herwekî ez piçûkê gişan bûm, ew ciyê şeref pir caran, ji min re dihiştin.

Di vê zivistanê de, cara pêşîn, agirê me hebûn, û dadê gelek bi kêfxweşî tenûr germ dikir. Piştî ku şîva me çêdibû û nan dihate pehtin, diya me bi palaseke

14

mezin devê tenûrê digirt ku bi şev sar nebe. Êvaran, em lidora tenûrê rûdiniştin û me lingên xwe dixistin tê de 11xwe germ dikir. Diya me ji pincarên ku ji havînê de me hişk kiribûn (tirşoyê kelandî) ji genim danû, û ji ard haşil, ji ardê qelandî jî dev şewitî û gelek xwarin ren-

gareng pêk tanin.

Ji bo çêrandina çêlekan, bavê min genim distand. Ewî bi vî karî, ji destpêka nîsanê heya dawiya çiriya paşîn, ango heya ketina berfa ewil radibû.

16

2- Kerê me yê piçûk

Şivaniya Molokan

Bavo, ku genim ji xwediyê dewaran distand bi pişta xwe dibire êş. Gelek hez dikir ku kerekî wî hebe. «Hingê, ewê şixul hêsanîtir bibe», wî pir caran digot.

Bê dewarekî, îşê me dijwar bû. Ji bo îşekî ne hêja, diviya bû em serê xwe liber cîranan xwar bikin. Kûlak (têr mal û pêre) ker didane me lê, ne bê tu tişt; ji bo kiriya wî, rojek an du roj, ji me xebat dixwestin.

Ji bo kirîna kerekî, bavo her sal du rûbl (pereyê rû3î) datanîn alîkî. Piştî sê salan, şeş rûbl bi girêkeke mezin di paçikekî, de, paçik di elbikeke tenekê de û elbik di xurcikê de, hatibûn veşartin. «Bi sê an çar rûblên din emê bikaribin kerekî ji xwe re bikirin», bavo digo.

Gelek caran, bavo girêka bi sir vedikir û pereyên paxurên giranbiha, jê vala dikirin. Bi dadêre careke din ew dijmartin. Di hesabê xwe de, xwe şaş dikirin û di cî de ji nûve dijmartin. Cama, em zaro, ji dengê wan

18

şiyarbilyî, me li wan dinêrî, çawa dijmêrin: bi hûrikên

5,3,2 kopek (pereyê rûsî) rûbl pêk tanîn, piştre paçika pere têde datanîn nav elbikê û elbik jî li nav xurcikê.

Di vê zivistanê de, bavo li cem Yûnanekîbi navê Polba Triandofilof dixebitî. Ewî aşek û gelek pez hebûn. Li biharê,li meha adarê, 4 rûbil dan bavo, ser de ji bo xebata wî ya baş jê re paltoyê eskeıî yê kurê Triandofilofhediye kirin. Û me di dawiyê de ji xwe re kerek jî kirî. Li dora heywên me çenberek girt il bi helahela me ew bir hundirê kadînê.

Ev kera ha, delala hemû malê bû; li havînê ewê dehşek anî. Me gelek bala xwe dida her du kerên xwe. Ji bo zivistanê me ji wan re jidil û can alif pêk tanî, me giya diçinî, me jê rêsî çêdikir, û gava hişk dibûn me ew dikişandin mal. Kera me, di mala me de gelek bi kêrî me dihat, me pê gunî û giya tanîn mal û li ser pişta wê me tûrên genim ên giran dibirin êş.

Di vê wextê de ez dûşivanekî têgihiştî bûbûm û pir caran bavo, kerê bi timamî disparte min û brayên min il ew bi xwe diçû maL. Salek welê derbas bû. Brayên min bûban şivanên bi serê xwe û ez jî bi bavê xwe re dimam. Nihu em li ciyekî din rûdinin, Aleksan-drovka; pişû ku bavê min bê şixul maba, em hatibûn vir. Di vê cihguharinê de kerê me yê piçûk gelek bi kêrî me hat. Ewî serweta me bi timamî kişand- palas, kulav, beroş, giyayê me yê nivînê û firaxin dîtir.

Bajarê ku em niho tê de bûn, berê Kurda jê re Konê Sor digotin lê mihacirên rûs ên Molokan jê re

20

navê Aleksandrovka danîbûn. Ev gundê ha 7 kılometre ji Qersê wê da ye û bi awakî gelek şaîrane li ber çemê Qasat hatiye ava kirin. Gava yek çem bi çem diçû, li doraliyên xwe wek xalîçe yên rengareng mêrg didîtin, û hinek li dûr, zeviyên çandiniyê yên çarkoşe kesk dikir, di nav zeviyan re, coyên avê li bin ûrêjên tavê wek şivên zîv diçirisîn. Li wî ali yê gund jî ciyê bîstanan bû. Molokan li wê kelem, gîzer û hêşinayiyên din diçandin. Aleksandrovka di nav hcşînayî û kulîlkan de xeriqî bû. Li biharê, wextê vebûna kulîlkan, bihneke xemrevîn li her derê newalê însan mest dikir.

Molokan di nav xweşiyê de dijîn û erdê wan têrhatin bû. Bi xwe, li her derê mintiqeya Qersê, gundên Rûsan li erdên baş hatibûn ava kirin, û Molokan li serê her nefs ji 50-80 donim milk hebû.

Aleksandrovka ji gundên ermenî, tirk û yûnan ên cîran gelek cihê bû. Molokan cotkarên pir şehreza bûn : ew aletên cotkarî yên pêşveçûyî bi kar tanîn, erdê bi cotên du gîsin dikêland, giya bi qiriman diçinîn û drûnê bi şeneyên kişandî yên mezin dikirin. Genim û ceh bi mangêran di zeviyên avdayî de tov dikirin. Lewra ne ecêb bû ku li cem Molokan hatina genim ji ya gundên cîran gelek baştir bû. Li zevi yên wan ên baş çandî nêrîn bi xwe zewq dida. Bi saya bolixiya giya Molokan pir dewar xwedî dikirin.

Xelkê Aleksandrovka du bir bûn û her bir dêr û keşekî xas hebûn. Molokanên kû1ak (dewlemend) ku

bi henek xelk ji wan re (merivên qenc) digotin, li me û liMolokanên feqîr gelek zilm dikirin. Carna, ewqas bê 22

insafli şivanên piçak dixistin ku bi saetan ve bê hiş em li erdê diman. Hîn di bîra min de ye, şivanek hebû, bi navê Misto, rojek -êdî baş nizanim- dewar dereng anîbû an du ga ketibûn bîstanê kû1ak Matîyû, evî hingî lê da, her dû dest û lingên wî şikênandin.

Ji me pê ve, çend şivanên din hebûn ku gelek di perîşaniyê de bûn. Lê, piraniya wan bê kif1et bûn, ji lewre halê wan dîsa dihate qedandin. Şivanekî gihaştî, bi kirêya xwe îdare dikir. Hîn tê bîra min, bi navê Cewoyê Bîrkele, şivanek hebû dostê bavê min bû. Cama, êvarên zivistanê, dihate mala me û ji me zarokan re serhatiyên xwe digotin. Ji tebea wî ya vekirî û nerm me gelek hej wî dikir û tucaran, gava ewî guhê me dikişand da dengê me bide birîn, em jê nedieniin. 24

3- Tadariya guran

Li payizê, gelek caran gur dihatin heya nêzîkî gundê me, xwe davêtin nêv kerî a pez dibirin. Dadê a bavo ji bo selarneta pezê ku me diçêrand, gelek ditir-siyan. Tirsa wan a mezin, nemaze, ji bo min ba; ewan dizanîn ku zarokekî wek min nikare xwe ji guran biparêze. Her êvar gava min kerî tanî mal, bêî ku tu pez jê kêm be, dê a bavê min bi dengekî bilind, ser hev:

«Şikir ji Xwedê! Şikir ji Xwedê ku roj bê xisar derbaz ba!... », digotin.

Gava di zeviyan de, giya dest bi hişkbanê dikir, jiyina me dijwartir diba. Bê pincar ku parekê xwarina me ya bingehîn ba, me têra xwe nedixwar. Vî halî, heya gihaştim! genim dorn dikir. Hingê me simbil jê dikirin, a li ser êgir me ew dikizirandin, fêrik çêdikirin a bi vî awayî birçîbfina xwe me dikuşt. Me çengek simbil diçinî, davêt nav agir a ew bi darek li hev dixist ku nehêlin simbil bişewitin. Piştre, me bi carek agir ji hev

26

belav dikir ji bo ku tene sar bibin 0 agir nekeve nav genimê zeviyê. Me teneyên baş qelandî di quncikek cilê xwe de hOr dikirin 0 jê xwarineke pak bi nave qelÛ10k çêdibO.

Piştîpaleyiya genim, di zeviyên vala da êdî tu tişt nedima. Ji aliyê din, di bîstanan de kartol digihaşt. Her sibê çi wext me pez dibir çolê, me ji pîrekên Molokan çend kartol dixwest; gava kebanî çavtengî dikirin 0 bera me didan, ji nêza xwe, bi veşartî em diketin nav bexçan 0 me dizî dikir. Bi vî awayî me timî kartol heban. Piştre me komek helez berhev dikir, agir ber-didayê û li benda vemirina wî diman da ku kartolên xwe bêxin di nav xuliyên germ de; piştre bi xwey me ew gelek bi lezet dixwarin.

Eger me dizî dikir ji neçarî bû. Şivan kiriya xwe li payîzê, dereng, piştî ketina berfê, distandin, û heya

wê wextê diviyabû em îdara xwe bikin.

Di nav pîrekên Molokan de yek hebû, gelek kêfa wê bi min dihat, xaltika Paraşa. Ewê hej min dikir. Bê şik dilê wê bi vî şivanokî reben ê ji sermê tevizî, dêşiya, ku serê sibê, li payizê keriyê pez dibir çolê. Heftê du car, xaltika Paraşa, bi dizî ji min re nan û xiyarên xweykirf didan.Tu zaroyê wê nebû. Gelek caran, êvaran piştî ku me pez dixist govê, ewê banî min dikir o bi bermayiyên şîvê ez têr dikirim.

Bêî ku em pê bihesin, payîza rast a bi baran, tevî serma 0 mija, dest pê dikir. Ber bi vê demê re, şixu1ên çolê timam dibOn 0 li beriyê ji şivana pêve tu kes

28

nedima. Lê min xwe bi tenê his nedikir; li cem min, hergav, hevalê min ê sadiq, seyê meyê pez, Kavreş hebit Min gelek hej Kavreş dikir, tucara ew bi gavekji min dûr nedibû.

Bavo tim digote min ku divê di payîzê de şivan çavvekirîtir bin; gur ji birçîna pir çavsor dibin, û hema firseteke piçûk bikeve destê wan, xwe davêjin nav pez a çendek jê dibin. Bavê min ez hînî xwe parastinê ji guran dikirin. Her sibê wextê derêxistina pez, ewî çend perçe darê çam ên hişk û qulkiıi dixistin tûrikê min. Min êdî dizanî ku ev dar zû pêdikevin û rewî neke mezin didin û eger gurekî êıiş kir, divê vî daıi vêxim û bixim devê wî, ewê baz de.

Rojeke sar û bi mij, min keriyê xwe dibir çêrê.

Piştî xuıiniyeke sivik, ez dîsa birçî bûbûm. Digel vê yekê, perçeyê nan ku sibê, dadê danîbû tûrikê min, gelek piçûk bû. Min nanê xwe kir du par, yek jê min xwar û ya di jî min da Kavreş. Lê ev perçeyê piçûk, şûna ku min têr bike, birçîbûna min hîn tûjtir kiribû. Wextê taştê nêzîk dibû, lê tûrik vala bû. Çawa bikim? Min keıi nêzîkî bexça kir, ketim nav wan û ji xwe re çend kartol dizîn. Piştre min pez bir ber şkeftekê. Li wê, komek helez hebû; min agir dada, xwe germ kir, û bi bêsebriyeke tamdar, li benda vemirina êgir mam da ku kartolên xwe bêxime di nav xuliyê de. Gava ku rewîn bi timamîvemiıi, bi lez û bez min kartolên xwe avêtin tê de.
30

Ji nişkave, min dît ku Kavreş radibe, guhên xwe bel dike û di nav mijê de li tiştekî dinêre. Dilê min his kir ku xeter nêzîk dibû. Lê ez gelek birçî bûm û ji min nedihat ku ez kartolên xwe di nêv êgir de bihêlim û herim. Ji ciyê xwe nedilebitîm û bi fîkandineke sivik min îşaret didan Kavreş. Se bi nûzenûz û reyîneke tûj di nav mijê de winda bû. Ez ji pi ya, şaş liber êgir dimam û min qenc guhê xwe dida reyina kûçik, pê re jî, bi çavên birçî, min li kartolên xwe yên nîv pijayî dinêıf. Dilê min xurt davêt. Di nav mijê de çi derbas dibû? Gur an diz? Şivanekî hîn bêtir tecribekar, ji reyina se wê fehim bikira ku Kavreş bêhna gur kiribû.

Çend deqîqe derbas bûn, Kavreş dîsa xuya kirû bi

reyinên xurt hate ber min, herwekî dixwest tiştekî bibêje min car din çû. Min fehim kir ku belayek hatiye serê me. Min lez da xwe. Destê min dilerizîn. Min êzingê çam xiste gopalê xwe, lê ji gêjbûna xwe min pêxistina wî ji bîr kir û ketim pey Kavreş. Bîstek dî, min du gur dîtin. Yekîji wan, ji nihu de miyek xistibû devê xwe û ê din jî xwe danîbû ber Kavreş, diranên xwe jê re qîc kirin, herwekî hevalê xwe diparast.

Di vê demê de, şîretên bavo hatin bîra min. Wek befikekê, min xwe gihande êgir, êzingê xwe pêxist û gava rivîna wî geş bû, min xwe avêt ser gurê ku miyek biribû alîkî. Gava Kavreş ez bi êgir dîtim cesaret girt û xwe avête gurê li ber xwe ku qet netirsiya. Şerekî dijwar di nav wan de dest pê kir. Dilê min bi Kavreş êşiya. Min dev ji miyê berda û çûm aıfkariya hevalê xwe yê sadiq. Di vê gavê de, Kavrcş gur xistibû bin

32

diranên xwe, lê heywanê kOvî bi awakî welê diranên xwe xistibOn qiriqa Kavreş ku kOzekûzên seyê rebenji yên gur bilindtir bOn. DiviyabO ez xwe bilezînim. Min bi destê xwe yê çep darê bi rivîn girtibû, 0 bi destê xwe yê rast jî min rahişt kevirekî. Min êzingê pêxistî anî heya ser pozê dijmin û heya ji min dihat, bi hiz, min kevirê xwe liparsOyên wî xist. Gur xwe ji lepên Kavreş derêxist 0 bi lez berê xwe da newalekê. Hevalê min êdî rizgar bûbO.

Digel vê yekê, gurê din mî kişandibû nav mijê. Ez

ji heyecanê dilerzîm; min berê xwe da aliyê wî 0 ez gihaştimê. Bi dîtina min, gur xwe da ber tehtekê, pez avête alîkî, 0 diranên xwe li min beş kirin.

Êzingê min êdî tu rivîn ne dida. Ez bê çek mabûm, o gur bi çavên xwe yên tûj û şerût li min dinêıi 0 xwe kar dikir bête min. Lê baş bû min xwe şaş nekir. Bêî ku ez çavên xwe ji gur hilînim, min hêdî hêdî êzingê din pêxist, ji siûda min bû êzing zû agir girt, û hingê min êrîş birê. Gava gurrivîna geş dît, xwe ji miyê bi dOr xist xwe gij kir û diranên xwe qfc kirin. Di vê demê de min reyîneke xurt bihîst, Kavre,Ş dihate hewara min.

Rewş herhal guhirî. Kavreş bera gur da, min jî kevirek avêtê, û piştre bi êzingê xwe yê pêxistî ez çûme ser û min agir xiste gepa gur, tirs pê ket û di ef de, di nav xiraman de winda bO.

Şer xilas bûbû û dijmin reviyabû. Min xwe nêzîkî miyê kir. Rebenê, ji tirsa dilerizî, û ji sê ciyan brîndar

34

bû. Gava ez vegeriyam keriyê xwe, min dît bizinek avêtiye erdê, gur ew dirandibû.

Min pezê belavbûyî da hev û ew anî nêzikî êgir. Ez ji tabê ketibûm, û birçîbûn ji ezabekê xurtir ez gêj dikirim. Bi destên xwe yên bi lerz, di nav xuliyên de li kartolên xwe geriyam. Kartol li ku ne? .. Tu tişt jê nemabû ... Giş şewitîbûn. Deqîqeke tehl ... Ez li ber girînê bûm ...

Ji goştê bizina dirandî min perçeyek da Kavreş.

Lê min bi xwe jê tam nekir û êvarê ji nêza diliyayî, ez vegeriyam gund. Min, bi rûmetî, goşt bir xudiyê wî ku ji bêsiûdiya min keşeyê Molokan bû. Xezebeke dijwar ew girt; ez birim axurê, û liwê, ewqas limin xist ku min nedikarî xwe ji erdê rakim. Ez bê hiş li wê mam. Bavê min hat û ez liwê dîtim û bi zehmet ez kişkişandim mal.

Adet wa ye ku şivan ji xisara ji pez re ji aliyê guran, neyin berpirsi yar kirin. Herwekî şivan bê çek in, ev tiştekî maqûl e. Lê, kûlak Selîverstov, mezinê Molokan, guh neda adet û qanûnan. Ji bo bizina di-randî, saliya min -çend rûbil û çend kopek- ji min birî.

Ji van peran mehrûm bûyî, ji bêgaviyê, zivistanê, ez li cem xelkê nanzikî xebitîm. Biharê, min xwest ez dîsa vegerim karê xwe yê ku min gelek hez dikir, ango şivaniyê. Ez pir geriyam ku ji xwe re ciyekî peyda bikim. Tu kes, ji bo piçûkbûna min bi min qaîl nedibû û digotin ku ez ne hêja me nanê zivistanê.

36

Piştî mideteke dirêj, gundiyekî ez ji bo zivista-neke timam birim cem xwe.

Li cem xudiyê min ê nO,gelek pez û dewar hebûn. Ez li axurê, li ser textikan radizam.

Şixul ne hêsanî bû, diviya bû ez berê şefeqê rabim, axur bimalim, zibil bibime hewşê, wê baş kom bikim, alifa paqij bikim, û ji gişan dijwartir êmê hespan bidim. Taqeta min nedigihîşt ku ez êm bi darek tevîhev kim û min awayek hêsatir dît: ez diketim nav

alifê 0 min bi destên xwe êm tevîhev dikir. Min ev tişt bi dizî dikir ku xudî pê nehise. Min giya dida dewarên din. Berê derketina rojê, diviyabû ez vana giş xilas bikim.

Ji xebata min a baş, axayê min, ji min gelek razî bû. Sibeha gava dihate axurê, ciyê hesp û yê çêlekan gelek paqij û dewar û pez têr xwaıî didîtin. Ez gelek dixebitîm ûji axur qet demediketim. Xwarinaminjîji min re tanîn wê derê. Bi tenê, rojên cejnê, min li mal dixwar, ew jî ne bi xweyiyên malê re, lê bi tena xwe.
38

4- Çetel bi kêrî çi tê ?

Havîn hat, xwîşka min Gogî û ez, me li cem yekî xwe kir golikvan. Havîn bê serêş derbaz bû û heya payîzê em xweş bi karê xwe rabûn.

Carek mielimeya gund, ji bavê min xwest ku ji bo şixu1ekî xwe min rêke Qersê, ji gundê me Aleksandrovka heft kîlometir wê da. Bavo razî bû. Mielime tûrek û mektûbek dan min JÎ bo mêrê xwe ku bi du kurên xwe re li Qers rûdinişt û li wê memûrtî dikir. Pişti ku ji bo vê zehmetê, min 15 kopek xistin berika xwe û tûrik avêt ser mi1e xwe, bi dilxweşî ez bi rê ketim. Li bajêr, ji bo peydakirina mal, li gora adresa ku da bûn min, ez gelek geriyam. Piştre, di hewşekê de min du kurik dîtin ku bi xweşî dileyistin. Bê pirsîn, min nas kir ku ew kurê mielimê ne. Min mektûb şanî yekî ji wan da. Kurik qîr kir: «Bavo, mektûbek ji yadê!»

Bavê wan, di ci de derket, mektûb vekir û pişû ku ew xwend, bani min kir. Zarok ji, ji hewşê hatin û em tev de ketin mezeleke di. Her du bira bi hev re pistepist dikirin û şaş li min dinêıin. Ji vi tişû bêhna min gelek teng bû. Bistek di zaroyên din û hin jin ji hatin. Giş li mezelê kombûyi, çavên xwe ji min hilnedikirin. Ez gelek ac~ bûm. Piştre, sebeb ji min re dan zanin; mielimê di mektûba xwe de gotibû ku ez Kurd im. Bê şerm, wek dehbeki ecêb, ji serê qehfê min heya neynûkên lingê min, li min dinêrin. Hin ji wan ji min çend tişt pirsîn; min ji bi lez bersiva wan da.

Wa dixuya, mielime, di mektûba xwe de hin tişt xwestibûn, ji ber ku mêrê wê em berdan û berê xwe da aliyê bajêr û ez ji tevi zarokan derketim hewşê. Zarok dora min girtin û ji min xwestin ku ez ji bi wan re bilêyzim. Lê her weki min leyistikên bajaran nedizanin, min xwe da alîki.

Gava bavê zarokan ji sûkê vegeriya, ew bani taştiyê kirin. Ji min re jî limetbexê xwarin dan. Xadima wan, jinekeke bi laş û gewde û bi hinarikên sor, fıraxeke şorbê da min û li cem fıraxê ji kef çi, kêr û çetelek danîn. Min dizani kefçi ji bo xwarinê ye lê, kêr û çetel ji bona çi. .. ? Min da eqlê xwe û min jê derêxist ku ev leyistikên zarokan in; hediyek ji min re ... Li gund, milhebên mezin min dibûn ku pê giya li ereban bar dikirin û kêfa min gelek bi van milhebokan hat. Min

sehina pêşin û a dîtir ji bi kefçiyê xwar û gava ez ji masê rabûm, min kêr û çetel xistin berika xwe. Xadima ku çavên xwe ji min nedizivirandin çû û mesele gote efendiyê xwe. Ewî ji min pirsî eger min dil dikir bi rê
42

herim an na? Min gotê ku min dixwest ku ez vegerim mala xwe. Rexma tiştên baş ku min xwaribûn û hediyên delal ku min standibûn, dilê min ne rahet bû. Hertişt livir ji min re biyanî û nenas bû û her kesîli min bi awakf ecêb dinên.

Efendî ji odê, tûrikê bendkin anî û du elbik jî dan min ku ez wan deynim bên1cên xwe. Ewî qesden ev tişt dikir da ku bibîne ezê çawa xwe jê derêxim. Lê, bi awakî gelek adetî, min çetel û kêr ji ben1cên xwe derêxistin û ew kirin paşila xwe, da ji elbikan re ci çêkim. Hingê efendî ji min pirsî :

- Te kêr û çetelê me ji ku birin?

- Ma, we bi xwe ew ji min re hediye ne kirin ... ?, bi telaş min jê pirsî.

- Bê şik, na. Kê ew ji te re hediye dan?

Ew jî şaş mabû. Ê min, êdî, min xwe negirt û bi xeyd min qîr kirê:

- Nexwe, wextê xwarinê, we çima ew danîn ber .mm ....?

Di vê gavê de zaro xeber gihandibûn cîran û metbex tije xelk bûbû; giş guhdariya me dikirin.

- Kêr û çetel ji bo xwarinê danîn ber te ne ji bo

tiştekî din, efendî gote min.

Min nedizanî êdî çi bêjim. Zimanê min nedi-geriya. Ez bi ginnê ketim.

Di nav jinan de ku lime kom bû bûn, Ermenîyek hebO; ewê xwe nêzîkî min kir û pirsan ji min kirin. Baş bOku min bi ermenî dizanî û kan derdê xwe jê re bêjim.
44

Bi girîn, bi dengekî êşayî û dilşkestî min gotê :

- Li van leyistokan binêre -kêr û çetel- ew ji min re hediye kirin û nihu jî dibêjin ku min ew birin.

- Ev ne leyistok in, jinika ermenî gote min, ew dan te da ku tu bi wan xwarin bixwî. ..

Dawiyê em li hev hatin. Hinekan dikeniyan û dilê hinekan jî bi min ve dima. Efendî gote xadimê ku du çetelên kevin bide min; lê ez xeyidî bûm û min ew red kirin. Efendî bi xweşî ez qanî kirim û dawiyê min her du çetelên giranbiha xistin paşila xwe. Piştî ku ji mielimê re mektûbek dan min, min 'ûrik hilgirt û berê xwe da dîsa gundê xwe.

Di riya xwe de, ev hadîseya pîs ji bîra min qet dernediket, lê digel vê yekê bi van çetelan ez ewqas ne dilşikestî bûm û min bi leyistika wan ji xwe re gelek xeyala dikirin. Gelek caran, li rê, ez disekinfm, min ew derdixistin, heyran heyran li wan dinerî û bi wan, kayên li erdê ketî hildikirin.

Wê roja ha, dinya pir xweş bû û ez beriya êvarê gihaştim gund. Min mielime, digel keça wê li hewşê

dît Ew li aliyê sefıkê disekinî û ji ber êzingên windabûyî bi dergavan re dixeyidî. Gava çavê wê bi min ket, nebi lez, bi aliyê min ve hat. Min mektûb û elbik danê.

Bi xwendina mektûbê mielime kenî, keça wê hat cem 0 sebeb jê pirsî. Wê jî, çîroka çetel gote, her du jî li min nêrîn 0 mideteke dirêj kemn. Min tûrik jî da wan. Mielime pesnê min da 0 got ku ez kurikekî gelek jîr im û hişt ez herim mala xwe.

46

5- Dersên pêşîn - Nifûsa min

Piştî du rojan, gava miclime bi keça xwe re digeriya, ber bi aliyê koxika me ve hat. Ez derketim û bi bez çûm pêşi ya wê. Ew bi şîrinî kenî û pirsa bavê min kir. Min jî bi lez ban bavê xwe kir. Ewî jî hat, bi edeb kumê xwe rakir û silav lê da. Miclime jê xwest ku mehê bi sê rûbil ez bibim dergevanê dibistanê. Bavê min bi dilxweşî razî bû û ez bi mielime re çûm dibistanê. Li wê, ewê beri gişan, ez birim ciyê êzingan û piştre dersxanê; li wê karên min çi bûn, ji min re dan zanîn: Diviya bû her roj, ez dersxanê bimalim, tozên mase, pencere û deri paqij kim, sobeyan pê xim, bermtl tije av kim, il her sibê il êvar semawara mielimê hazir bikim ilji bo şixulên wê car car hcrim bajêr.

Roja pêşîn, gava ez ketim dersxanê, hema heyran min temaşaya tabloyên li dîwaran daleqandî kir. Çi nebû li wê? Teyr, heywan, heşerat, xerîte ... Min tu tişt

ji wan' demedixist, lê kêfa min bi wan gelek dihat. Bi tenê, tiştek hebû nedikete serê min; li cem teyrên rengareng tabloyeke ecêb û bi tirs hebû. Ev zilamekî bi
48

qehfeke rût bû. Di qehfê de diran û şûna çav û difin qulên mezin hebûn û ev zilam bi tenê ji hestiya pêve ne tu tişt bO. Welê dihate min ku, ev yek ji wan cinan bû ku li mal em pê ditirsandin. Tesîra vî tiştî di min de ewqas mezin bû ku gava ez di ber re derbaz dibûm min çavên xwe digirtin û êvaran, di tariyê de, min nediwêrî bi tena xwe li odê bimînim. Min gelek hez dikir mana vî ji mielimê bipirsim, lê ji fehîtiya min, ji min nedihat. Piştre min bala xwe da ku şagirt qet guh nedidan vê tabloyê. Bi vî awayî dilê min jî êdî xurt bû. Hêdî, bê tirs ez li ber dimam û min seyra tabloyên teyrên xweşik dikir.

Roja pêşîn, gava êvarê piştî şixul ez vegeriyam mal, hemî xelkê malê bi kêfxweşî dora min girtin, min jî ji wan re yek bi yek çi dîtibû û kiribû got. Bavê min bawer nedikir ku mehê sê rûbil bidine min û pir caran digo ku eger rûbilek biwa dîsa baş bû. Lê, gava meha min qediya mielime banî me kir û ji min re 3 rûbil dan. Min nedizanîn navê xwe binivîsim; şagirdekî li şûna min îmza min danî. Mielime pere xiste destê min, emir da min ku ez ji xwe re çakêt û şebqekê bikirim û gote min : «Hingê ezê te bêxim dersê û te bielimînim xwendin û nivîsandinê.»

Bavo ji bona kirîna çakêtekî minasiptir razî bÛ,lê ji bo xwendin izna min neda; ji tirsa ku eger ez jî wek şagirtên din bielimim, ez êdî tu kiriyê nestînim. Ji min re pantalonekî kevin, şebqe û saqoyek li gora min gelek mezin kirîn. Bi vî awayî ez nihu ji berî bi cilê xwe ê kevn kêmtir diketim ber çavan. Li dibistanê, bê haya

50

bavê xwe, ez diketim dersê, ji dil dixebitîm û bi ser de jî, min karên xwe yên dergevaniyê jî xweş bi cî tanîn.

Min, bi rûkenî û kêfxweşî hemû şixul dikirin û mielime ji min gelek razî bû. Lê, rexma çekên min ê nû, zaroyên Molokan nedixwestin li cem min rûnin û digotin ku ez gelek qirêj im. Mielime mecbûr ba min bi tena xwe bide rûniştin.

Di şobeya nûhati yan de, min dest bi xwendinê kir. Min pir dixwest ez bielimim û ez zû bi hêsanî dielimîm. Mielime pir caran dihate maseya min a didît ez bi çi _ xîretê herfan dinivîsim. Pesindanên wê ez teşwîq dikirim û roj bi roj ez gelek pêşve diçam. Em hînî elfabe, bi tipên li ser kartonê zeliqandî, dikirin; me ew dibijartin a ji wan pirsênji me xwestî pêk tanîn; minjîher gav ew pirs ji ber dikirin.

Ez bi keça mielimê, Marûsiya re, babam heval. Ew keçikeke gelek delal a qenc ba a di şobeya dibistanê ya diwemîn de dielimî a baş bi xwendin a nivisandin dizanî. Ewê di naskirina tîpan, dirûstkirina hecan a pirsan de gelek arîkariya min dikir. Her du

mielimeyên min, ya mezin a ya piçak, ji pêşveçfinên min ecaîb diman. Min gelek hej Marûsiya dikir, û sibeha gava, za, li dersxane a mezela mielimê, min sobe pê dixistin ez li ser pê çiyên xwe dimeşiyam da ku wê şiyar nekim.

Carek serê sibê, berî destpêkirina dersan, min semawar anî û ew danî ser masê a vegeriyam; di vê gavê de, mielime ez sekinandim a Man1siya bi awireke 52

cidiO bi çavên biken ji min re elfebayek hediye kir. Li ser kitêb, nivîsandineke destan hebil ku hingê min ne-dikari' bixwenda. Ez lê heyran mam il ji vê hediyeyê ewqas kêfa min hat ku min nedizanî çawa ji bin vê qenciyê derkevim.

Gava şagirt hatin, ez li pişt maseya xwe rilniştîbOm il bi serbilindî kitêba xwe danîbû ber xwe.

Êvarê, carek ji ders 0 şixul xilasbOyî, min kitêba xwe danî bin milê xwe il min bazda mal da ku xwişk û brayên xwe jî ji kêfxweşiya xwe paydar bikim. Bi kitêbekê vegera min mal, qiyamet rakir. Xelkê malê min girtin, li kitêba min bi elaqeke mezin nêrîn 0 guhdariya mesela wê kirin. Di gel vê yêke, xwîşkên min bawer nedikirin ku tiştekî ewqas baş ji min re hediye kiribin 0 ji bavo il yadê re digotin ku her hal, ew kitêb li şilnakiriya min a meha diwemîn dane min. Her çend jî bi sond 0 yemîn, min gote wan ku ew elfabe ji min re hediye kirine, dîsa baweriya wan bi min nedihat

Roja dîtir, xwîşka min a mezin bi yadê re çO cem mielimê da rastiyê jê seh bikin; gelo min ev kitêb bi pere kinôO an ji min re hediye dabûn?

Mielimê gote wan ku ewê, ev elfabe, ji min re hediye kiribO, bi ser de jî ewê his kir ku li ber zimanê xwîşka min tiştekî dî heye 0 newêre bêje.

Mielimê fikra wê fehim kir 0 gotê ku wê belaş dersa min dida, ku ez lawikekî gelek xebatker 0 zîrek im il ku serê salê, gava ewê here bajêr, ewê ji min re cilekî kevn ji yên kurên xwe bîne.

54

Gava min dît ku halê min çêtir dibı1, min hîn bêtir xwe da xebatê da ku rojek berî rojekê bikaribim kitêba ku Marûsiya ji min re hediye kiribı1, bixwînim.

Rojek ji rojan, Marûsiya ji min pirsî ka ji kitêba wê ez çi elimîbı1m ı1 rûpela pêşîn vekir? Min zû, zû, xwend: «Ma-şa na-şa (Meryema me), Sa-şa (navek) au-ua (hece), oza (moz), h.ş ... » Marûsiya bi lez çû cem diya xwe û gotê ku Şami1ji nihu de elimiye xwendinê. Mielime heta nêzîkî min û piştî ku guhdari ya xwendina min kir, destê xwe li ser serê min gerand, ez pîroz kirim û got: «Ji îro bi şı1nda, tu êdî zû bielimî!».

Ji pesin û hezkirina mielimê, ez ewqas bextiyar bı1m ku min nedizanî çi bêjim û çi bikim, ez gelek sor bûm ı1hindik mabı1 ezji di1xweşiyê bigirîm ...

Ez bi Marûsiya re dost bı1m, lê zaroyên Molokan hejî min nedikirin, li min dixistin, ez diheqirandim û

nedihiştin ku ez bixwînim. Marûsi ya ez ji wan dipiras-
tim, diket navbera me ı1bi xweşî dixiste serê wan da ku
dev ji min berdin.
Bi vî awayî, zanîna min li dibistana gund dest pê
kir.

Li havînê, gava dibistan girtîbû, min şivantî dikir,
lê nihu, di tûrikê min de, licem perçekî nan, kitêbek
jî hebû, min tê de, tiştên ji berê de e1imî, dîsa
dixwendin. Li zivistanê, wek berê, min li dibistanê
dixwend ı1karên xwe yê dergevaniyê jî dikirin.

Bi pêşveçûna xwe, ez pêşiyê sinifê bûm û min
gelek numereyên baş distandin: pênc û çar, li di dersa
56

dîn de min sê stendibû ji ber ku min ji vê dersê hiz
nedikir û nedixwest wê hîn bibim.

Ûsa, di çend salan de, min dibistana gund qedand
a xwendin û nivîsandin hîn kir.

Rojek, bavê min xurcîn vekir, jê desteyek kaxitên
kevin derêxist û ji min xwest ku ez jê re pasporta wî
pêyda bikim. Nihu bihar hatibû ûji me re pasport lazim
ba, ji ber ku, me dixwest em xwe neqlî bajarê Vladî
Qers bikin. Bi zanîna xwe, min xwe dinepixand û yek
bi yek min ew kaxit giş xwendin; di nav wan de,
wesîqeya jêrîn kete berçavên min.
Emir:

Ez emir didim muxtarên gundan û bajaran ku ji bo
dîtina mehîneke boz, esî1 û rana w€ ya çep damxakirî,

arîkariya Şemoy€ Adil bikin. Heçî bi emre min nake, ewe bete ceza kirin.

!mzay€n Sereke polîs€ û katibe mintiqa Qizil Çak-Çak.

Ez şaş mabûm ... Gelo bavê min di wextekê de zilamekî hikûmetê bû, ji ber ku di emir de hatibû gotin ku diviyabû hemî muxtar arîkariya bavo bikin, yan na ewê berpirsiyarbiwana ... ? Bavê minji dil kenî û gote min ku berî çend salan, ew li gundê Qizil Çak -Çak şivan bû, û serekê polîsê vê minteqê jî li wê rûdinişt. Rojek mehîna wî winda bûbû û bavê min nedikarî wê peyda bike, hingê, Serekê Polîs ku gelek hej mehîna xwe dikir, ji bavê min re emrekî nivîsandî dabû; ewî jî

58

bi aıikariya muxtaranmehîn bi dest xistibû. Bavo gote min ku wê roja ha bi xwe; ez hatibûm dinê, bi awakî welê ku ew wesîqa, bi tarîxa 28 çiriya pêşîn 1898, nifûsa min bi xwe bû.

Piştî ku min dibistana gund qedand, bi mideteke piçûk, em ji A1eksandrovka derketin û ben çûn gundê VIadî Qers, ji wê jî, saleke dî, cem Kurdên koçer, da ku li w~ dîsa, şivantiyê bikin.

Di gundên Kurdan de yên li aliyê me, xudîkirina pez ne wek a Molokan e, li cem van koçeran, di welatê çiyan de heyat bi temamî, bi awakî din bû.

60

6- «Baro-dan» - Cejna biharê

Jiyîn di gundekî kurd de, ne wek ya gundên rûs ên Molokan e, li wê, ê bêtir bi ziraetê mijûl dibin. Kurd xwedî pez in, û li çiyayên bi têr-çêre û giya rûdinin. Çêreyên çiyan dewlemendiya welêt pêk tînin, bi deh hezaran pez li wê diçêrin, goşt û bez digrin.

Li zivistanê, çiya bi berfa stûr pêçandî ne lê li bin tîrêjên rojên biharê yên pêşîn tebîat zû vedinije. Berf dihele, erd nerm dibe, hêşinayî û kulîlk qûntarên çiya dixemilînin.

Li çiyan, hewa siviktir e û wek li newalan ne germ e. Ji lewre li wê, li havînê bi xwe, giya tu caran hişk nabe. Şûna giyayên hişkbûyî, giyayên din ên ter der-dikevin û kulîlk ciyên xwe ji yên nû re dihêlin. Pez her gav çêreyên ter liber xwe dibîne û ji sibê heya êvarê bêî ku ji germi yê aciz bibe, diçêre. Li wê, wek li newalan, pez ji pûşî, mêşên mezin û heşeratên din aciz nabe. Li ser deviyên çiyan çivîk, refên teyr 0 tirûdan bi hev re difirin û nêçîra kelmêş û mêşa dikin.

62

Hema berf dihele, giya şîn dibe û kulîlkên daran vedibin, gundê kurd xwe tev dide.

Serê sibê zû, çûn û hatin destpê dike, Kurd xwe pêk tînin da ku bi keriyên xwe ve herin dolgan.

Kurd li dolgan gelek bala xwe didin berxên nû-zayî, wan xweş têr dikin da ku zû mezin bin û bikaribin gava dinya dibe genn, derkevin zozanan.

Li zozanan, Kurd, bi awakî xaş dicivin hev û bi navê obe ji 40 heya 80 êl pêk tînin, da bikaribin tev de, li çiyan keriyên xwe biçêrînin. Li serê her oM obebaşiyek heye, endamê dewlemendtir û bi nifûztirê xudiyên pez. Her tişt di bin emrê wî de ye. Ew bêş davêje ser xelkê, ciyê çêreyan nîşan dide û wextê zivirandina wan dibêje. Ew merkez bi întixabê dibû û gelek bi şeref bû, diviya bû her kes bê lam û cîm emrên obebaşî bi cî bîne. Obebaşîhemen hergav serekê qebfle ye û li ber çavên feqîr û karkeran hakimê mitleq e. Ji lewre, li ser şivanan wacib e ji şixulên xwe yên şivan-tiyê pêve, hemî karên obebaşî jî bê pere biqedînin: anîna pezê wî konê, her êvar jimartina wî, her sibê paqijkirina govan û derêxistina ziblê derve.

Li gundê Karakala em bûne şivan. Em di meha sibatê de hatinê, û hema giya di newalan de şîn bû me pez da hev û me ew bire dolgan.

Li gora adetên wî ciyî, piştî pez digehe dolgan û dest bi zaYÛ1ê dike, her Kurdê dewlemend pezekî seıjêdike, xwarin dirust dike, cîran û şivan diezimÛ1e.
64

Xudiyê pez \1 jina wî bi destê xwe xwarin didin mêvanên xwe. Piştî xwarinê, ku li derva tê xwarin, xort stran dibêjin \1 bi şivanan re direqisin. Gava cejn diqede, her kes spasên xwe pêşkeşî mêvandarê xwe dike \1dia dike ku jina wîli havînê gelek r\1n\1penîr pêk bîne, ku tu nexweşî neyête pez \1ku zozan bi xweşî here

seri'.

Wê roja ha, mêvandar gelek comerdî nîşan dan \1 ewqas nan \1goşt dan me ku çar rojan têra xelkê malên me kir.

Kurd ji vê cejnê re Serê Pez dibêjin. Di heyata xwe de cara pêşîn ba ku min ev tişt didît \1jê heyran mab\1m; lê yadê \1 bavo dikeniyan \1 digotin ku Serê Pez ne cejneke ewqas mezin e, lê di nêzîkê de, Baro-dan, roja salê ya xweştir, wê bê. Ez jî bê sebir, li benda Baro-danê dimam.

Ji roja ku berxik hinek mezin \1xurt b\1n\1berf hîn bêtir li çiyan heliya, obcbaşî roja Barodan, ango derketina pez ji dolgan ber bi zozanan ve, tayin kir. Beri' hefteyek her kes haziriya xwe ji vê rojê re dikir. Ev roj bi xwe hat.

Serê sibê, xelk, giş cilên xweşik ên cejnê li xwe kirin. Keçên ciwan, cilên bi rengên ronak \1 têrzînet wergirtî, serên xwe bi kulîlkên ter dixemilandin \1 karafil (xizêm) datanîn bêvilên xwe. Karaffi xizêmek zêrin ê qasî polokek 5 r\1bilba û xelekek zêrin pêve kiri b\1.Kurdên dewlemend hê di zarotiye de bêvilen keçên

66

xwe qul dikirin ji bo xizêmê. Kurd, li stûyê mî, beran fi bizinên xwe ku1î1k.ên rengareng danîbfin fi li yên nêriyên çêtirîn jî zengilên sifir ên reng bi reng xemi-landî daleqandibfin. Piştre mî fi berxan ber didan nav hev û saeta meşê tayîn kirin.

Ber bi rê derketina me ve, roj li ifıq qederek bilind bûbû. Ezman safi û bê ewir bû, hewa bi xweşiya germiya rojekê biharê û bi bêhna kulîlkan dagirtî bû.

Her tişt pêkhatî bû û obebaşî emrê seferê da. Li pêşiya Baro-dan bi cilê xwe yê xweşiktir û bilûra wî di dest de, serşivan dimeşiya. Ewî wezîfeya serfermandar dikir; ji şivanên xort re, ji bo îdareya berxikên piçûk û miyên neban talîmat didan. Li dû serşivan nêriyê mestir fi spehîtir dihat, li stûyê wî zengi1ek hebû ku, awê digotin, dengê bilindtir dida.

Berê em bi rê kevin, axa banî şivanên xwe dikirin fi ji wan re digotin: «Bi girtina te ji xwe re şivan, ez ji te dixwazim ku tu wezîfeya xwe baş bi cî bînî û qenc bala xwe bidî pezê min.» Gava tenbîhat qediyan, serşivan dest bi blûra xwe kir û em giş bi rê ketin. Keriyê me bi nîzam lipey şivan û xortan diçû û dûşivan fi zaro li her du alî, vir da, wê da, baz didan, nedihiştin ku nîzam xirab be û bi gopalên xwe, an bi fikandineke xas, di nav kerî de, ji her pezî re ciyê wî nîşan didan.

Ji vê rojê heya nihu gelek sal derbaz bfine, lê tesîrên cejna Baro-dan a pêşîn, di bîra min de, pir vejandî mane. Her wekî îro bû, ez li ber xwe rûyên

68

biken ên zaro, xort û şivanan dibînim a stranên wan dibihîsim. Arxalix, oyme a beşmet, cilên bi neqiş yên keçikên delal a serê wan ên bi kulı1kan xemilandî, xemlên mî a mêsinan di ber çavên min re derbas dibin.

Newal giş bi heşinayiyê pêçandî ye. Li her derê, ronahiya rojê diçirise û li dûr, çiya hîn li bin berfê ne. Barîna mî û ya berxikan, stranê şivan û xortan lidûr, di newalan de olan didin û gundî ji malên xwe derdikevin a tên seyra me.

Ev tişt, di salê de du caran çêdibin, libiharê, gava pez dibin zozanan û li payîzê dereng, gava ji zozanan vedigerin mal. Divê ji bîr nekin ku dewlemendiya Kurdên koçer gî di keri yên wan de ye. Kurd ji şîr, ne bi tenê penîr û rûnê xwe yên salekê derdixînin, lê jê gelek jî dibin bajaran û li wê digel hirî û pezên xwe didin û ji kifletên xwe re tiştên lazim dikirin. Divê ku bacên xwe bidin a ji malên re tiştên ku li bajêr tên firotin peyda bikin. Ûsa, qet ne ecêb e ku Kurd, çûn a vegera zozanan di heyata xwe de bûyerên hêja bigirin a rojên Baro-danê wek dema mestirîn a salê bihesibînin.

70

7- Li zozanan

Riya heya qonaxa pêşîn ne kin bû. Xort, piştî çend kîlometir, bi hêwirze, bi me re meşiyan, em berdan û vegeriyan malên xwe, lê şivan û dûşivan barên wan li pişt wan, hêdî, hêdî, dom bi riya xwe dikirin. Adetî, roja ewil mesafeyeke piçûk dibirin. Piştre, her roj, hin bi hin wê zêde dikirin da ku pez gelek newesûnin û wî hînî cîguhirandinê bikin.

Kerî, ji hev û du hinek dûr, lidû hev, bi rê ve diçûn Li qonaxa pêşîn, em hinekJawestan da ku pez hinek

bêhna xwe bistîne û biçêre. Hingê, bavê min, wek serekşivan, ji me re, dest bi parkirina diyariyên ku axeyan dabûn me, kir : nan, goşt, helaw û meywe yên hi şkki rî. Bi rê de û li warê pêşîn, heya hatina axan, bavê min wekîlê wan bû. Li rê, êvaran şivan dihatin cem bavo û şîret jê distandin. Gelek pirsan jê dikirin: ji bo istiraheta mî û berxikan çend car rawestan diviyabû, çend car ji wan re avdan lazim bû ... ?
72

Li warê pêşîn, em bi tena xwe pirneman. Piştî çar rojan, axên me bi k.ifletên xwe ve hatin fi di cî de konên xwe danîn. Konên Kurdên dewlemend gelek mezin fi bi çar, pênc çîtan ji hev veqetandî, bi mehffir fi qoşmeyan (kulavan) raxisû bfin tê de ciyek ji bo mêvanan fi xwarindanek cihê hebû ji bo rûn, penêr fi dew. Konê feqîran piçûktir bû, ji malikek rûniştinê fi razanê fi xwarindanek pêk dihat.

Kon, hin ji wanji hev dûr, hinekan jî li cem hev, li quntarên çiyan, li nêzîkî tehtan, lehî fi robarên çiyan, dihatin danîn. Ji dûr, ev konên reş, wek warekî eskerî', dixuyan.

Di van robaran de, masi yên berad hebûn, ku di wê wextê de ber bi kaniyan ve derdiketin. Li hin ciyan kaniyên zeal û sar ji zinaran dizên. Her kes xwe, li wê, şidiyayî -0 şêntir dihesiya û şixul ji me re xweş û hêsanîtir dihat. Zaroyên axan, ji sibê heya êvarê, li derve diman, dileyistin, di robarên nêzîk de, masî

digirtin û li çêre giya diçinîn.

, Jiyîna şivanan, bi awakî din bû. Li vir jî, dewlemendên kurd ji yên Molokan kêmtir em ne-diêşandin. Li vir jî em perîşan û bedbext bûn. Di hatina me ji deştê ber bi zozanan ve, di ser kevir û zinaran re em hema pêxwas gihaştibûn jor. Gava me pez dibir çolê, ji dirih fi daran, cilên me diqetiyan û em bi k.incê zerzilî d1man, wek li cem Molokan. Bavo ji min re ji hiriya miyan kumek çêkiribû, lê ew gelek grûzerkî bû, guh û st6yê min dixurand. Ev kum ez ecêb diêşandim

74

a

ji serma

disitirandim.

a

baranê, ji tîrejên genn ên tavê kêm

Malê minji van tiştan pêve neba: kulavê şivaniyê ku bi şev min xwe pê dipêçand, tûrikê xwey, perçeyek nanê timî hiştk a tasek sifir ku pê min ji xwe re ava vexwarinê tanf. Cama, ji şivanan hinek şîr min bi dest dixist. Diviyaba ku xwarina genn tu car neyê bîra me. Digel vê yekê, halê min dîsa ji yên din hinek çêtir ba. Her du sê hefte carek, min dikaıî serekî bidim mal û li wê ji destê diya xwe, xwarineke g~nn bixwim. Bav û birayên min, hin ji me bi jortir, li serê çiyê, li nav zinar a kendalên ku qet rê û şiverê pê nediketin û pezên bi qiloç nikaribûn derbas bibin, pezê mêşin diçêrandin.

Ewan bi mehan rûyê mal nedidîtin.

Li ber destê min kerek hebû ku pê, cama, berxek nexweş an ling-şikestî, min tanî mal. Hûrmirê min jî giş, li ser pişta vî kerî ba. Şivana hemû, 24 saetên xwe li bin ezmên derbas dikirin. Wextê baran a bager, min xwe li bin beriha, di şikeft an di quncikeke şil de, vedişart a bê agir, bi cilên xwe yên şil, bi saetan ve, li wê,ji sennê dilerizfm. Cama, bi heftan, heta bi mehan ve, min dengê tu însan nedibihfst.

Di jiyîna xwe de, li ciyên kûvî, em her gav li ber xetera mirinê ban. Me pez, ji tada guran, ji çeteyên dizan, ji herikandina sfpanên berfê û ji gundirbûna keviran diparast. Cama, kevirên mezin ji serê çiyan bi dengekî gur digundiıîn û li ber xwe çi heba, dibirin newalan.

76

Bi rojan, em li palên çiyayên asê, di kenarên zinaran re a di kortalan de dimeşiyan, pez ji ciyên bi xeter bi dar dixist a bala xwe dida ku tu ziyan negihê axayên me. Cama bi strandin, an bi fikandin, bê tirs a tel aş , wek pezkaviya,ji tehtckê me xwe davête tehteke din. U, piştre, me li jêr dinêrî a li bin xwe, newalan, an kortalên kar ên bi lehiyan, didftin, tirs dikete dilê me a em jê gêj diban.

Her wekî dibêjin : ji mirinê, em bi tiliyekê, dûr bûn. Le masûlkeyên me pêşve diçan, xurt dibûn a hisên me ziravtir û zfztir dibûn. ç'tvên şivanan gelek baş

dibfnin. Di ef de, bi roj an bi şev, gava tiştekî xeıi'b xwe bi dizî keriyê nêzîkî keriya me dikir, em pê dihesiyan a dengên gelek nizm, xûşîncke piçak nêzîkî keriyê za digihaştin guhên me.
78

8- Leyistikên me

Car car, dOşivanan kefiyên xwe nêzîkfhev dikirin o bi xweşibi hev re di1eyistin. Hinji leyistikênme ji yên kevin bûn ku ji piçûkahiya xwe de me dizanîn, lê hin jê, me bi xwe derdixistin. Ew ji pir caran reqis 0 stran bûn. Mesela, me destên hev digirtin û me heleqeyek çêdikir; yeki ji me distrand û ên din ji bi dengeki lê vedigerand. Yek ji stranên me ev bA:

« Lo şivano, lo, lo şivano!
Tili zêro, dil kovana.
Bi vî dengê xwey xweş,
Ew di bLOrêde dixûne.
Lê lê dayê şivanok,
Baş guh nade keriyê.
Lê lê dayê şivanok,
Dilikê min ketiyê.
Dayê min bidin şivanok,
.8;ıvo min bidin şivanok.
Ezê timîpêre şabim.
80

Eze ji bo qelene bedewa xwe

Bibim şivane baye we
Sibe bû
Roj wa hilda
Zere eniya bedewa min
Şewq şemal da
Min heft sal temam şi van û kir
Qewlseeta me hatiye
Eze ji bedewa xwe re
Kemberek zîvî bikirim.»
a
a

Me stranên kevin ên li ser egîdan jî, digotin. Wan zilamên ku bi mêranî, ji bo bidestixistina çêreyên baştir, xwe davêtin ser Kurdên din, ew dikuştin, an ew bi xwe di şerek bê eman de dihatin kuştin. Em wisa jî bi leysitikeka xasa şivanan, zeze, dileyistin. Leyistik ev bû : her yek kêrek an darikek çîk dixist nav pêçiyên piyê xwe û heya jê dihat ew bi aliyek ve dûr davêt, yek ji leyistikvanan diviyabû timî bigota ze-ze-ze û bêi ku hilma xwe berde here bemû tiştên avêtî berhev bike. Eger ew berî ku hemûyan berhev ke hilma xwe berda leyistikê winda dikir. Cama, me bêhna xwe, bi şerê berana jî derdixist, ji nav keri yên xwe, li beranên xurt û şerker digeriyan,.ew berdidan hev û seyra wan dikir. Karkirî ji me ew bû ku beranê wî bera yên dîtir dida.

Ev leyistikên me bi dizî çêdibûn. Axeyan qebûl nedikirku em keriyên xwe bînin cem hev; ji tirsa ku pez têr nexwe û goşt negire ... Di tenhayiya me de, teseliya

me ya bingehîn, blûra me bû.
Her yekî ji me yeka wê hebû û xweş lê dixist Blûr
82

bi kên gelek tiştan dihat: bi hewakîhezîn, me pez û ken li hev didan, bi ahengeke din me ew dibirin avê, dîsa bi nexmeke din me banî yên windabûyî dikir. Hêdî, hêdî me ew hîni deng û nexmeyan dikir. Gava berxik hin gelek piçûk bûn û me ew dibirin avdanê, me ji wan re, bi awakî welê lê dixist ku li ciyên din nayê lê xistin. Gavame xweydida wanji bo ku bêtir giya bixwin, dîsa bi hewakî xas me ew didan hev.

Berxên me zû dielimîn dengên blûrê û ew ji hev gelek xweş ferq dikirin. Kîjan deng ji bo kîjan sebebê bû, zû dikete guhê wan û li gora wî dikirin. Di nav berxan de me ji hinekan bêtir hiz dikir û navên dilovan li wan datanî : Kavê, Kurê, Qerqasê.
84

9- Yê ku şîr dide

Gava ku em li serê çiyan tevî keriyan digeriyan axeyên me bi şîr mijill dibûn û jê xurekên ku demeke dirêj hilanîna wan û barê wan sivik be çêdikirin. Ev, bê guman, bi awayekî iptidaî, dihate pêk anîn. Li cem kurda çêkirina rûnê nivîşk karekî zehmet û giran e û barê milê jina ye. Kebanî hemû şîrê çêlek, mî û bizinan e ku di rojê de hatiye dotin beri nav qazanên sifir ên mezin didin ; heryekji vanqazananji du tadehsatilan

hildide. Qazanê datînin ser agir û gava kela şir radibe wê atînin û dihêlin ku hinek sar bebe. Qasî her deh deqîqan carekê kebanî kevçiyek şorbê tijî mast dixin nav her qazanê û serê wê bi poteke ji hiri bi navê yelop qenc dinixêmin. Serê sibe hertişt hazir e û kebanî mastê qaz anê dixin nav denênji çerm ku jê re meşktê gotin. Piştre karê girantir dest pê dike. Divê ku van meşkan carina bi vî alî, carina bi aliyê din ve bikulin û carcarna hinek ava sar bi ser ve zêde kin, heta ku mast bibe dew. Ew wisa zû bi zû nabe dew, divê ku xwe gelek bi vî karê
86

yeknesak 0 wetar biêşinin. Gava ku êdî mast dibe dew nava meşkan hemO vala dikin tOrikên caw 0 rOnji dew vediqetînin. Piştre rOnê hazir ji tûrik derdixin, ew bi ava sar dişon, xwe pê werdikin 0 ew dixin derdanên xas.

Ji bermayiyê rOn re bi kurdî dew dibêjin û jê jî cureyek pênirê spî çêdikin. Xwey lê dikin û hin giyayan dixin navê û gava ku ew baş hevOdu digre, ewî dixin tûrên cawî û tiştekî giran datînin ser tûrik ji bo baş vî penîrê bê avdan bê givaştin. Dew û avdawê didin golikan ; heçî penîrê spî yê givaştî, vî dixin nav deman. ev penîr yek ji xureken sereke yên Kurda ye. Dew lemend jê miqdarek mezin, qasî deh heta panzde de-nan, feqîr jî ji bo malbata xwe yek an du denan hazir dikin.

Penîr jî bi awayekî ne kêm iptidaî tê çêkirin. Jin

şîrê ku di rojê de hatiye dotin berdidin nav qez anan. Divê ku ev şîr bi adan be, rûnê wî jê nehatibe standin. Ji bo Kurda ji şîrê bê run penîr çêkirin gunehkariyeke mezin e 0 ji vî şîrf re şîrê bê îman dibêjin. Piştre şîr dikelînin û havên davêjin nav. Kurd havênê xwe ji berê miyan çêdikin ; gava mî dizên berê wî distînin, bvaş bi sîlikê dişon 0 ziva dikin. Piştre ew hûıfıûr dikin heta ku her perçeyek bibe qasî poleke piçûk 0 paşê vî havênê bji bo çêkirina peİû'r di qazanan de bi kar tînin. Şîr zû havên digre, di panzde an bist deqîqan de tîr dibe. Piştre qazanan vala dikin nav tûrikên cawî yên xas û devê wan girê didin û ew datînin ser tehteke hilû kevirek mezin datînin ser wan. Penîrên givaştî ku ji lorikan derdixin pehn 0 giroverên in 0 ew li ber hewayê hişk dibin.
88

veger

Cejna payizê Beran-berdan

10-

Koçeriya Kurdên xwedî pez ne bê sebeb e. Li biharê di newalan de berf zû û li çiya dereng dihele. Beri, li quntarên jêrin dest pê dike û hêdî, hêdî, her hefte, liciyên ku berf li wê winda dibe, li bin genniya rojê, erd şîn dibe û bi giyayên teftê raxistin. Bi berfê re ku hin bi hin xwe bi şûnda dide, koçer bi keriyên xwe ve, hîn ber bi bilindahiyê ve derdikevin. Li payîzê, piştî nîvê çiriya pêşîn, tevdan ber meqlûb dest pê dike. Li newalan baran û li çiyayên bilind berf dikevin; Kurd jî,

bi keriyên xwe ve, ji berfê direvin, berê xwe didin jêr û digehin warên xwe yên berê; li wê, nihu giya ku li havînê hişk bûbûn, ji nû ve, ter derdikevin. Piştre, di dawiya payîzê de, pez dadikeve newalên ku hîn berf li wê neketiye, eger bikeve jî zû dihele û qet xwe nagire. Digel vê yekê, berf dereng namîne ku bigehe newalan Ji zozana
90

ji, hingê, xwediyên pez bi keriyên xwe re vedigerin wargehên xwe yên zivistanê.

Kurd, vê vegera payizê bOyereke bi xêr dihesibinin; ji ber ku rojên zozanan her xweştir 0 ser-bestir bin ji ne bê xeter in. Ev dem bi xweşi digehe dawiya xwe 0 keri bi selameû vedigerin ciyên xwe 0 şivan ji kiriya xwe ya havÛ1ê timam ji axayê xwe werdigrin. Digel vê yekê, ev roj ne wek a Baro-dan~ ye. Di vê de kêmtir tevdan 0 can heye. Guhirandina mewsim li ser nefsa Kurdan tesireke mezin dike. Ev tesir, di dema hatina rojên payizê yên bi mij 0 baran de, hîn bêtir xuya dike. Yek dibê qey pez bi xwe bi vê gühirandinê dihese. Gava min pezê xwe ji zozana ber bi genni yana ve dibir, welê ji min re dixuya ku heywan, bi serên xwe yên bi awakî dilşkesû xwar kiri, ji borina rojên serbestî yên çiyan poşman bOne 0 naxwazin vegerin govên teng 0 heya dawiya zivistanê, ji azadi mehrOm, tê de biminin.

Lê heyat bi ihtiyac 0 zerOretên xwe, me her gav

bindest dike. Jinên xweyî pez, li ser riya vegera mal, ji hev dipirsin eger havin xweş derbaz bO an na? Bi hev re hesab dikin 0 ji hev dipirsin her yekê ji wan, çiqa rOn, penfr 0 cacf li hev daye?

Kurdên dewlemend, bi xirabî 0 bi hesOdiyê, qala Kurdên feqir, ku rexma kêmaniya pezên xwe, bi xebat o zirekiya xwe bi nisbeta wan, gelek rOn 0 penfr, çêkiribOn, dikin. Zilam hesab dikin, bêi ku xesarê bighfnin mala xwe çiqa rOn, penfr 0 biri bikaribin

92

bifroşin Q bi pereyê wan ji xwe re genim Q ce bikirin. Kurdên koçer ku bi piranî bi xwedîkirina pez îdara xwe dikin, bi çandiniyê mijQ1 nabin. Ji lewre mecbQr in dexlê xwe bikirin. Ev, ji bo wan meseleyeke gelek muhim e.

îşê peydakirina çêreyên zivistanê jf ne hêsanf ye. Herwekf koçer li havfnê ji pezê xwe re ji bo zivistanê tu êm pêk naynin di zivistanê de pezê xwe derdixînin çêreyan.

Pfrekên can bi tiştên ku ji çerçiyan kin"ne xwe dinepixfnin Q wan şanf hev dikin: destmal, derzf, ta, bişkok, kibıit Q zfnetên por. Xort Q keç sirên xwe dibêjine hev; ji xwe re kê Q kê dergistf girtine a wan bisûnin an na? Dilketf behsa rojên bextiyaıi yên zozanan dikin, a ciyên ku bi delalên xwe re, bi saetan, liwê diman, tfnin bîra xwe: kaniyên ku ji ava wan a sar Qzelal vexwarin, şevên tavheyivê, gava bi tena xwe, ji

çavên xelkê dar, libin stêran, liserê çiyan, di nav kulflk a heşfnayîyê de, deqfqeyênjiyfna xwe yên xweştir der-baz dikirin, lawikan digotin a direqisfn Qdi dawiyê de bi navê Xwedê sond dixwarin ku heya mirinê ji hev re sadiq bimfnin. Ev tişt nihu, giş, dihatin ber çavên wan a pê dilê wan davêt.

Keç diyariyên ku ji dergistf an dilketiyên xwe standibOn, şanf hevalên xwe didin: gustı1kên zfv, ên sifr, eynikeke dora wê zêrkirî, moıikên rengareng. Xort jf ji aliyê xwe hediyeyên xwe şanf hevalan dikin: destmal, cizdanên bi mirariyên piçakneqişkirî,kirasên bi neqşên hevrfşim, goreyên hirî, lepik ... Ev giş a li

94

dora wan. giyayên zer. kulîlkên çilmisî. dar bi pelên xwe yên hişkbOyî. ezmanê tad bayên hişk, deriyên zivistanê vedikin libenda wê disekinin.

a

a

Bi vî awayî, Kurdên koçer bi kiflet û keriyên xwe ve liser riyênji ber baranên payizê bi herf. ber bi warên zivistanê ve dimeşin. Gava digehinê. pirek hûnnirên xwe zO saz dikin. tiştên ji çiya ani bi ci dikin. pez dijmêrin û karên xwe pêk tînin.

Piştre cejna beran-berdan tê. Ji vê re. ji her kesi bêtir. kêfa şivan 0 ya dOşivanan tê. Di vê rojê de. karê wan xilas dibe 0 kiriya xwe ya hav inê ji axên xwe distînin. Roja beran-berdanê. mi dixin govekê bi tenê

o beranên tovê ku. li havînê, ji wan cuda diçêriyan, berdidin nav wan. Ûsa dikin ku li biharê. mî giş di carekê de bizên.

Gava beran berdidin nav miyan, Kurd tifıngan berdidin. herweki şahineta zewaca mi yên xwe dikin. Wê rojê ha, xwarinên rengareng çêdikin : mirtoxe, gata. qawinne ; xelkê dieziminin şivê bani belengazan dikin 0 ji wan re xwarin didin.

Keçên ciwan, destmalên xwe ji serê xwe dikin û wan davêjin stûyê beranên hêjatir 0 xort ji diçin destmalên keçên ku hez dikin 0 dixwazin bistinin, direvinin. Dê 0 bav bala xwe didin ka kijan xort destmala keça wan distine. Bi vi awayi dizanin ku keça wan li havînê, bi vi xorti re li hev hatiye û di dilê wê de heye ku wi bistine. Eger dê 0 bav razî dibin, nîşana wan

96

tête birin Û pişti demekê jî, daweta wan çêdibe. Bê guman, dê û bav adeti bêtir hez ji dergistiyên dewle-mend dikin û di demên berê de kêm axeyên zengîn razî dibûn ku keça xwe bidin şivanekî.

Piştî cejna beran-berdan, xwediyên pez hesabê şivanên xwe didîtin. Şivanekî, ji bo xebata xwe ya havînê, ji 8 heya 9 pez distandin û dûşivanjî, ji 3 heya 5. Li gora adetên ciyî li ser her 25 serî, şivanekî pezek distand. Bi vê hesabê, xwediyê 200 an 250 pezî, diviya bû 10 an 15 pez bide şivanê xwe, ev jî li gora dijwarî û zehmetên ku dihatin kişandin, ne tu tişt bû. Lê, bi ser de,

her xwediyê pez, bi awakî din em dixapandin. Ew bi cîranên xwe li hev dihatin, miqabilê pere, keriyên wan jî bi yên xwe re dibirin wzanan, û bi vî awayî 200, 300 seri bêî ku tiştek bidin şivanan, didan çêrandin. Lê selamitiya vê keriya zêde jî ji şivan dihate pirsîn.

Digel vê yekê, rexma kêmbûna kiriya me, li cem Kurdan halê me ji yê li cem Molokan çêtir bû. Ji bo miyekê ji aliyê gura revandî, an dirandî, Kurd ji heqên me nedibirî û wek Molokan, bi bêinsafî ewqas li me nedixist. Jê pêve heqê her şİvan hebû ku lihavînê ji xwe re, bi dilê xwedî, pezekî seıjêke. Ji bo sivikkirina perîşaniya me, ev tiştekî gelek giranbiha bû.
98

11- Pezên windabûyî

Mirina birakî

Havîna dîtir dîsa li gundê Karakala Reş li cem Baroyê Evdê em bûn şivan. Bavo, her du brayên min û ez, me çêrandina hemû pezên wî baranta li ser xwe girt. Me gelek bi xweşî karê xwe pêk tant me guh dida gotinên bavo û bi xwe jê şîret dipirsîn. Bavo êdî pîr bûbû û çêrandina pez êdî jê re pir zehmet dihat. Me bi tena xwe şixul dikir û nedihişt ku bavo rind ranezê û gelek biweste.

Lê bavo li ser vê yekê pir bi ya me nedikir. Ewî bi tenê bi roj rahet dikir û bi şev, her weki baweri ya wî bi me nedihat, ew bi xwe diçû ber pez. Ewî digote me ku xort bi şev nikarin heya sibê bê xew bimînin, û ku bi şev

diz bi tifingan têne pez. Gur jî bi şev bêtir xwe davêjin keriyan û bawerî bi kûçikan jî bi tenê nabe.

Gava dibû şev, bavo kincên stûr li xwe dikirin, çifta xwe digirt, saçme dadigirt, nizim difikand û

100

çavên xwe di tariyê de digerandin. Ji kOçikan re ciyê sekna wan nîşan dida 0 li wê ew didan vezelandin û nobet girtin. Bi tenê Bêlas, seyê hêja, tim bi wî re dima o bi bihustek jê ne dibO.

Rojekê, serê sibê, gava em şiyar bûn, brayê min Bro ne xuya bû. Em gelek lê geriyan 0 li tu dera me ew peyda nekir. Bi vî awayî ez 0 birayê min ê piçOk Derwêş bitenê li ber pez man. Pişû çend mehên din hin Kurd gotin me ku Bro li gundekî dûr şivanû dikir. Bavê min, di ci de bi rê ket û çû wî bîne. Lê Bro nexwest vegere û got ku li mal bi têra xwe nedixwar, ku kifletên malê gelek bûn 0 çêtir bû jê re ku bi tena xwe bişixule; qet nebe bi vî awayî ewê birçî nemîne. Bavo û yadê gelek li ber ketin, Bro bi rastî malê xwedî dikir. Berî şivantiyê gava ku betal bû ew tevî yadê diçO bajêr û gundên ciran zekatê bertıev dikir. Gava ku ew tevî me bû halê me xweştir bû. Lê liavakirin 0 gazinên dê 0 bavê me bê feyde bû, Bro xistibû eqlê xwe ku bi tena xwe bimîne û hemO havînê li gundekî din şivanû kir.

Havîn bi xweşî derbas bû lê, li payizê felaketek hate serê me :ji keriyê me sê pez winda bOn. Bavê min pir li wan geriya, lê taba wî vala çO. Ji ber bê umîdî, çû

cem falçiyekê, ewê jî gote ku şivan Mîrza Temo ew dizîne. Bavo çO cem, xeber danê û jê xwest an peza an heqê wan bidiyê. Şivanê reben sond dixwar ku haya wî jê nebû, lê bavo, jê bêtir bi gotinên falçiyê baweriya xwe anî 0 bi xeyd çOcem Mûsa Beg, serekê eşîra Mîrza Temo. Beg gelek bi nifûz bA, çi dixwest dikir. Da ku giliyên bavê min bibihîse, jê berxek xwest. Bavo qail bA 0 bi vî awayî ket dîwana wî 0 gotê ku li gora fala

102

qereçi, Mirza Temo sê pezên wi dizine. Mirza Temoyê reben, ku tu cara dizi nekiribO, bi sond ü yemin xwe xilas nekir, MOsa Beg, bi zor, sê pez jê standin, lê şûna ku wan bide bavê min, ew ji xwe re hiştin. Bavê min ji vê miamelê pir aciz ü dilşkesti bO; çend car çü cem beg ü pez jê xwestin. Lê MOsa Beg guh nedayê 0 dawiyê gotê ku eger dom bi tel ebên xwe bike, ewê wi bide girtin 0 lêxistin. Bavê min dizani ku her tişt ji destê Beg tê, tirsiya ü nema bi ser de çO. Me êdi dizani ku pezên me winda bûne, ü bi wan re, kiriya me ya havinê ji. Em li ber diketin, pir caran hêstir di çavên me re dihatin xwar ü me digo ku bela li pişt hev, wek kevirên giran, têne serme.

Êvareke xweş a payizê, ez, bavo û brayê min Derwêş, gava em li çolê rOniştibûn 0 me nanê xwe dixwar ü şirê ku me nO dotibû vedixwar, Kurdek, ku me nedinasi, hate cem me.

Kurd, qedrê mêvanan ne bi tenê li mal, lê li çolê

ji digirtin, ji lewre, bavo di ci de çü, şir do şi, xwarin û vexwarin danin ber mêvanê me, jê re li ser kulavekî nivinek çêkir ü piştre jê pirsi ka ewê bi çi dikaribO arikariya wi bike. Mêvanê me, piştî ku spasên xwe pêşkeşi me kirin, ji bo şivê û mêvandariya me ya germ, gote ku eve çil roj in ku sê pezên biyani ketine nav keriya wi 0 pê re diçêrin; ji xelkê pirsibO 0 gotibOnê ku ên me ne, ji lewre hatibO xeberê bide me.

Ji vê xeberê em ewqa kêfxweş bûn ku me nedizani ji bin qenciya ku vi zilamibi me dikir, çawa derkevin.
104

Piştre me bi hev re xeber da; welê derlcet ku mêvanê me ji wek me şivanekt bi icare bû û ku ev bela bi xwe rojek hatibû serê wi ji, ji lewre dilê wi bi me ve mabû û ewqas zehmet dabû xwe ku vê xeberê bigehine me.

Roja dtı:ir ez pê re çûm da ku her sê pezan bînim. Gava em nêziki ken hatin, şivan û dûşivan xwe lidora me civandin û ji min xwestin ku ez pezên xwe bina-sim ...

Ji dûr, min li keriyê mezin nên; ûsa, bê imkan bû ku ez wan ji nav ewqas heywanan, derêxim. Hingê ez derketim ser tehteke bilind û di et de min dtı: ku her sê pez, her weki biyani ne, bi tena xwe diçêrin.

Şivanan pesnê min dan û gotin ku ez pisporekt hêja me. Piştre ez sekinandim ji bo xwarina goştekt biraşti, bi isûla şivanan : pişti ku berxekt qelew gurandin û postê wi jê derêxistin, goştê wi kur kirin,

giyayên bi bibin û sirik damn tê de, û disa ev goşt xistin nav çermê. Di vê gavê de, dûşivan, li erdê ciyek ne gelek kûr kola bûn, postê goşt tê de xistinê, ax liser kirin û li ser wê ji agireke mezin dadan. Du sê saet bi şûnda, agir û ax ji ser de avêtin, û hêdi hêdî, postê goşt tê de derêxistin û ew danin nav kodikan.

Bêhna goştê di nav giya û sirikê de biraşti, bi vi awayi iştaha me vejand, bi xwe ji sibê da me tiştek tam nekiribû~ Bêhna giya, ewqas xweş bû, goşt ewqas tamdar dixuya ku bê aram (sebir), em li benda xwarinê diman. Her wekt şivan li cem hev bi isûl, bi heleqe

106

rOdiniştin, min xwe digirt ku bê edebî nekim û berî wan xwe navêjim sifrê. Lê çi tivek bi lezet !

Pişti xwarinê ez vegeriyam mal. Bavê min mina-sib dî ku here cem Mîrza Temo û efwa xwe jê bixwaze. Lê, Begê zalim guh nedida feqîrên wek me û Mîrza Temo; ji lewre, ewî her sê pezên Mîrzayê reben, jê re venegerandin. Qereçî jî, ji derketina pezên me beicîû derewên wê li her derê hatin bihîstin û êdî tu kesî miraceata wê bi tu tiştî nekir.

Havîn Osa derbas bû. Dû wê, pfiyiz bi mij, baran û bi bayên xwe yên cemidî, bi serme de girt. Brayê min Derwêş, bi nexweşiyekê ketibû, tum ser û parsûyên wî diêşiyan û roj bi roj êşa wî zêdetir dibû. Bi zor dikarî li dû kerî bimeşe û hin bi hin ji taqet diket. Dawiyê kete nav nivîna. Bavê min çû cem hekîmekî kurmancî. Evî

tewsiye kir ku tenûr germ bikin, pezekî serjêkin, çermê wî derênin, brayê min tê de bipêçin û midetekê, li ser devê tenûrê bigirin û rojê, du sê car vî tiştî tekrar bikin.

Bavo û yadê gotinên hekîm, yek bi yek bi cî anîn. Bi ser de jî, hekîm ji brayê min du sê car xwîn berda, di nav şîr de kilis keland û ew danî ser singê wî. Van dermanên ha tu tesîreke baş neda. Brayê min, hin bi hin, ber bi mirinê ve diçû.

Bavo, dilşkestî, miraceata pîr û şêxan kir. Lê, ewan jî, ji êşa reben re tu çare nedîtin û Derwêş terka me da û ji destê me çû. Bê wî jî êdî bavo pîr bûyî, nedikarî keriyên mezin îdare bike. Ji wê rojê bi şûnda,
108

li cem zilamên bi pezên hindik şivantî kir. Bi vi işi dikari bê berdest ji rabe. Ser xwestina wi, ez Çam bajêr, da ku ji xwe re karekî peyda bikim, qet nebe, yê dergevaniyê. Belê, bi şivantiyê, êdi me nedikari nanê xwe derêxin ilji z6da bi xwe, me bi têra xwe nedixwar.
110

12- Li bajêr - Şerê emperyalîstan

Cîranên me yên kurd xwe pêk tanîn ku herine bajêr, liwê genim û cehên xwe bifroşin û bi pereyê wan ji xwe re şekir, çay, cil û caw û tiştên dîtir ku ji wan re ji bo zivistanê hewce bûn bikirin.

Diya minji min re nan peht, tûrek dirût, cilên min ên qetiyayî çêkirin û bi şev min xwe gihande kar-

wanekê erebeyan û di du rojan de em gihiştin Qersê.

Bajarê Qersê, li milê çiyaki hatiye avakirin. Li serê çiyê, keleheke mezin heye. Li dora Qersê, li ciyên bilind gelek asêgeh hene; bi xwe, Qers bajarekî eskerî ye. Kêfa min, gelek bi wan xaniyên, bi du sê tebeq, bi kolanên kuçkirî û bi bexçeyên di heşînayiyê de xeriqî dihat. Lê, .. bêtir ez lê hêyran dimam mexazeyên mezinê bûn. Min nedikarî ji ber cemekana ku lipişt wan ewqas tiştên bi texlît 11spehî hebûn bi dûr bim. Ji bo peydaki-

112

rina karekî ez li her derê bajêr geriyam û min ew xweş nas kir.

Ez li xanekê peya bûbûm û kiriya wê bi xebata xwe derdixist: her sibê min axur paqij dikir û hewş dimalî. Bi roj ez li şixulekî digeriyam. Lê, her roj destvala dizivinm xanê û pereyên min jî digihaştin dawiya xwe. Ji 25 kopek pêve, tu tiştê min nemabû. Yekê, hingê şîret limin kir ku ez herim febnqeya kevirê xiram ku liAlexandrovka vekiribûn, gundê ku berê me li wê şivantî dikir. Ez çûmê û li karxanê rastî Molokan hatim ku min bi wan re li dibistanê dixwend. Bi arîkariya wan, ez ketim şixuL.Xebata min ev bû: danîna kevirên ku ji bin axê derdixistin, di sendûqan de. Qederê 150 keç û xort bi vî îşî mijûl dibûn.

Ev kar ne gelek çetin bû, min zû xwe hînî kir. Ji şefeq heya bo rojava, em dixebitîn, ango, qederê yanzde saet û nîv lihavînê, û deh saet lizivistanê; rojiya

me jî, bi tenê, bi 30 kopek bû. Min kevirên baş û xirab ji hev ferq kirin; mehê, ji bo cûdakirina wan ji hev, ji min re ıo rûbil didan. Piştre min her du xwişkên xwe jî xistin xebatê. Gava ew hatin û bi cî bûn, me ji xwe re xaniyek bi tena xw~ girt; welê halê me hinek xweş bû û me dikan, ji bo dê û bavê xwe, çend kopek jî deynin alîkî. Di vê febnqeyê de ez du salan xebitîm; gava em hîn li wê bûn, Cenga Emperyalîst (Şerê mezinê pêşîn ê salên 1914-1918), dest pê kir.

Di payiza sala 1914 de, alaya sisiya ya Kozakên Kizlaro-Grebenskoy, hate gundê Aleksandrovka û li nêzîkî fabnqeya me bi cî bû. Pincar, piştî şîvê, ez

114

diçilın alayê, ji Kozakan bermayiyên xwarinê dixwast a min ew tanî malê, xwe pê têr dikirin.

Rojên yekşembê, ez bi wan re diçilın çem; gava hespên xwe dişfiştin min gelek arîkariya wan dikir. Eskerên Kozak a çend zabitên wan gelek hej min dikirin. Gava Fermandarê wan bihîst ku ez baş bi kurdî, rOsî, ermenî a tirkî dizanim,ji min xwest ku mehê bi 25 rObi1, ez li alayê bimînim a bibim tercimanê wê. Xwişkên min digirîn, nedixwestin ku ez terka wan bidim. Lê, 25 rObi1mehê ji min re ji hêstirên wan bihatir bfin; min guh neda hêviyên wan fi ez ketim ordiyê. Lê berê, min sê roj izin xwest da ku ez xwişkên xwe bibime mal fi vegerim. Piştî ku min ev tişt bi cî anî, ez vegeriyam alayê fi min dest bi xebata xwe kir. Digel

bicîhanîna karên xwe yên tercimani yê di navbera zabit, memfirû muxtaran de, diviyabû bi riyên wê minteqê ez giş bizanim, ji hespa re êm bikirim û bi tacira re jî bazar bikim.

Piştî heftekê, di bajarê Kaxîzman re ber bi Saı1bû1ax, li ser tixûbê tirk, em bi rê ketin. Berê, em li ser cadê dimeşiyan, piştre, li ser qerara fermandar, em ketin şiveriyên gundan. Karê min pir dijwar bû: min hem tercimanî, hem jî rêberî dikirin; diviyabû ez bi xelkê cî re xeber bid im fi rê binasim. Pircara em bi şev dimeşiyan, li welatekî bi çiya, bi geliyên kûr, rêveçfin a rêderêxistin ne tiştekî hêsanî bûn; şopên dewaran û şiverê li gelek ciyan tevîhev dibûn. Gundiyên wê derê hej Rûsan nedikir û pirîcar rêyên xelet şanî me didan. Carek Kurd û Tirkên wê derê em xapandin. Gava zabitên me hesiyan ku em di reyekê xelet re diçûn,
116

miawinê fennandar bi hêrs ket t1du qirbacên xweş li min xistin; di gel vê yekê tu sûç di min de nebû.

Welatê ku em tê re diçûn, gelek spehî' bt1. Lê pêşveçûn jî pir dijwar bt1, girbûna keviran, zinarên bilind, kaşên asê t1lehiyên çiyan, meşa me dereng dikir. Hespên alayê ne elimîbûn rêveçûnê. Em mecbûr man bîst t1çar saet sekinîn, me solên hespa nûkirin û erebeya selihandin. Jê pêve jî her ro, em hinek radiwestiyan ; li çend ciyan, pirîcar di newalên bi star, me bêhna xwe distand, xwarina çêdikirin û dixwarin. Adetî, alay bi

şev ji warê xwe bi rê diket ji bo ku meşa xwe ji dijmin veşêre. Rojaneha em gihiştin sînorê Tirkiyê. Esker hin bi hin li Sarîbû1ax kom dibûn û li dirêjahiya geliyên kûr ên ji dijmin veşartî, komên xwe datanîn. Piştî istiraheta çend rojan, eskerên rûs derbazî tixûbê Tirkiyê bûn. Sê kîlometir ji San'bû1ax wê da, şer dest pê kir. Top, tifing û mîtralyoz dinya li hev dida, di geliyan de olan dida. Gurgira wan bi awakî dayimî hewa dadigirt!

Karê me ew bû ku em di pişt çiyan re bizivirin û paşiya eskerên tirk bigirin. Di vê zivirînê de min rê winda kir; ji ber ku Kurdên koçer rêyeke nerast şanî min dabt1n. Pişti vê hadisê baweriya serekên alayê êdî bi min nema. Welê hate wan ku min ew xapandibûn; ez ji tercimaniyê derêxistim û ji bo du mehên xebatê bi tenê 7 rûbil dan min. Heyif bt1 ku ez karekî welê berdim, lê tu tişt ji destê min nedihat; min nedikarî li cem kesî gilî bikim.

Alaya me bi rê ket tl li serê çiyan, bê çek, li welatekî nenas, ez bi tena xwe mam.

118

Bi ku da herim? Min qerara xwe da ku ez vegerim Saıib01ax 0 ji wê ji herim Qiznefer, cem mêrê metika xwe ya miıi. Di van geliyên kOrde, tije dehbeyên kuvi, bi tena xwe man ne tişteki xweş bO. Bi dileki givaşti 0 tevizi, ez bi rê ketim 0 hêdi hêdi, gava ez fıkiıim ku ev ne cara pêşîn bû ku ez li ber xeterê dimam, cesaret hate min.

120

13- Hezkirin û jin xwestin

Wek ez ditirsiyam nebû; li rê ez rastî tu serpêhatinê nebûm. Sax, selîm, ez gihaştim Sanôûlax û ji wê Qiznefer. Li wê, min merivên xwe zû peyda kirin. Mêrê metika min ez nas nedikirim. Bi tenê ewî ji şivanên ku ji navçeya Qersê dihatin bihîstibû ku ez diçûm dibistanê û ku min bi xwendin û nivîsandinê dizanî. Ewî ez gelek bi xweşî qebûl kirirn a pirsa xelkê mala me kir. Ecebmayî dima ku riya 50 kfiometir, bê tirs, ez tena xwe hatîbim. Minjîji wan re bi kurtî, çawa ez li fabrtqeya kevir dixebitîm, çawa ez bûbûm terci-man û çima ez jê hatibûm derêxistin, gote wî ...

Welê, qederê mehekê, ez li cem apê xwe mam û di vê midetê de, di îşên malê de, min alikariya keça meta xwe, Karê dikir. Em her du jî xort bûn; di vê mehekê de, berê, em bi hev re bûn dost, piştre, bi rastî, dilê me kete hev. Bi hêvî û rica Karê ji min dixwest ku ez wê mehir bikim; eger bavê wê bêdilî bikira, ez wê birevînim. Pirsa melûn "ez ji ku qelen peyda bikim" li ber me wekî serê bilindtir ê çiyayê Agirt disekinî. Ma

122

ez rebentirê dinyayê nebOm? Min ne pere, ne jî pez hebOn 0 min dizanî ku bavê Karê wê bê qelen nade min. Li ser vê meselê ez 0 Karê, em çiqas fikirfn. Karê, heta stranek jî çêkir 0 tê de lanet li wana anî ku frotina jina

kirine adeteke kirêt û genî.

Ji careke bêtir, bavê Karê zilamekî tirtire û bê dil, ku ji tu kesê nehatiM hez kirin, xwe têkilî axaftinên me dikir. Digo ku şêxê mezin, heta pêxemberê me bixwe, jinên bi qelen anine; nexwe, Xwedê bi xwe ev adet danîye. Karê ciwaba wî dida 0 digo ku bav keçên xwe wek dewaran difroşin, wek pezê adî 0 ji bo isbat gelek mîsal jî tanîn. Lê dawiya wan pevçûnan her girtn û hêstir bû. Gava min dît ku iştixalî bê feyde ye 0 em nikarin vî kalî şerût iqna bikin min Karê bire alîkî, min gotê ku divê xem nexwe, ku ezê bixebitim û qelenê wê pêk bfnin.

BajarêSarfbûlax,ku li ser tixûb bû, bûbû qerargeheke mezin. HemA eskerên rûs ku diçOn eniyê anjê vedigeriyan, liwê kom dibûn. Gelek eskeran li wê, ez wek tercimanê kevin dinasîm 0 ez bi xwe re dibirim xwarinê.

Rojekê, serê sibê, eskerek hate mala me 0 gote min ku serekê qerargehê, Mîralay Emerik, min di cî de dixwaze da ku jê re tercimaniyê bikim. Min zû cilên xwe wergirtin û çûm Sarfbûlaxê. Di van rojan de, gundiyên dorê, gelek zad 0 qAt anîbûn vê qonaxê. Tu kes ji wan bi rûsî nedizanî 0 tu Rûs jî ji zimanê wan fehim nedikir.

124

Gava ez nêzikî erebeyan bûm, min dı) ku fermandarê qerargehê bi xwe li nav gundiyan sekiniye 6 dike

nake nikare ji wan fehim bike çima naxwazin pêştir herin? Bi kurdf minji wan pirsf: gotin min ku dewarên wan ji tabê diketin 6 ku rê gelek asê ba. Ez ç6m cem fermandar, min silaveke eskerf dayê û çi ji gundiyan bihfstib6, gotê. Fermandar li min nêrf, kenf 6 ji min pirsf eger min dixwest ez bibime terciman, min bi çend zimanan dizanf, mehiya min berê li alayê bi çi bû û çima ez jê hatibûm derêxistin ... ? Min jê re vegerand ku ez bi kurdf, bi ermenf, bi rûsf û bi tirkf dizanim û sebeba derketina xwe jf ji alayê gotê. Fermandar ji zanfnên min şaş ma û ji min pirsfka di kfjan dibistanên bilind de min xwendibû ... ? Minjf gotê ku ez Kurd im, ku bi tenê rûsf min di dibistanê de xwendiye û şehada xwe şanf wf da ; zimanên mayî, min li cem Tirk û Ermeniyan şivantf kiriye û bi vf awayf, min zimanên wan girtine. Fermandar emir da ku çekê eskerf li min kin û ez mehê bi 25 rûbilan bixebitim.

Bi karê min ê nû halê min gelek baş bû. Sanoûlax nihuji aliyê Drûjîna Orengbûrg(Eskerên bi emir gelek mezin ku du caran eskeriya xwe kirine) işxal kirin. Ji wan re Ordiya Isa digotin, ew jf jê gelek aciz diban. Min pirsf çima vf navf liwan kirine û esker gotin min ku ev hemû eskerên ihtiyadf ji bo Çar 6 Welat hatine şer û li ser şewqeyên wan xaçên mezin hene. Ji bo nfşandana sedaqeta wan ji Çar re.

Carna erebeyên xwarin û zad gelek dereng dihatin û yekfneyên eskerf bê qût diman. Hingê, zabitê le-

126

wazim Andrîev, miawinê wi Nîkolayêv Q ez, bi çend Kozakan re, em diç6n gundên dora xwe da ku pez, dewar 0 dexil bikirin Gelek caran, malê gundiya, hema hema bê pere distandin. Li ber çavê me, muhasib qayimeyên sexte pêk tanin Q gundiya icbar dikirin ku wan imza bikin; pereyê kêm didan wan 0 pereyê mayi bi zabitên din re par dikir.

Min zivistanên sala 19140 1915 bi timami li wê derbaz kirin. Herweki her tiştê min li ser ordiyê bOji meaşê xwe min kêm xerc dikir û_min pereyê xwe giş dida bavê Karê, Zahiro, li ser hesabê qelen. Ez pêre bi 150 rûbil li hev hatibûm; eger min ev pere gi bidayê, Karê wê ya min bibiwa 0 hingê heqê min hebO ez wê bibim. Qelen ne gelek giran bO, Zahiro bi vê miqdarê razi bObû ji ber ku ez ne xerîb lê kurxalê Karê bûm.

Bi vi awayi, hin bi hin, min qelenê Karê dida Zahiro. Ev tiştekî hêsani nebû, lê ji bo anina Karê, minê her tişt bikira ... Gava ji qelen çi dima min da, min sê roj izin stand û ez çOm cem Zahiro; min jê re got ku divê Karê hazir bike ku ez wê bibim cem dê 0 bavê xwe û disa vegerim ser karê xwe. Lê hingê tiştek qewimi ku min tu cara neanibû bira xwe. Zahiro qebOl nekir keça xwe bide min û bi eşkere got ku min tu qelen nedabûyê Q ku bi zor min dixwest ez Karê birevinim. Bi xeyd, min gotê kUol1linqelen dabûyê.

Zahiro bi tehqir limin nêrî, her tişt inkar kir 0 got:

- Ka şahidên te? Li ber kê te pere da min? Isbat

bike ... !Ka xwezginiyên te ?
128

Ev pirs wek brOskeke li min ketin. Min fehim kir ku Zahiro ji xeşîmî 0 dilpakiya min dixwaze pereyê min bixwe 0 Karê bifroşe yeki din ê zengfntir. Li ser pêvçQna me, dran li dora me kom bûbûn; ewana dizanîn ku min qelen dayê, bi qend gotin Zahiro ku bêbextiyê neke 0 keça xwe bide min. Lê zilamê çikOs o zalim, guh neda wan 0 herweki du qasê min bû, rabO ku li min xe. Tifınga min li ser milê min û qûndaxa wê jî li destê min bûn. Gava Zahiro hate min, min baz da. Ew kete dO min û ez li hewşê girtim. Destê xwe avêt tifınga min, lûla wê girt û ew bi ali yê xwe ve da. Bêî ku ez vegerim paş, min xwe avête pêş û tifıng di destê min de teqiya. Zahiro di cî de hatibû kuştin.

Ez girtim 0 ez birim cem fennandar, ji wê jî gundê Kûlpî, li cem serekê polisê minteqê. Di pirsiyarê de, şahid 0 Karê jî bi wan re îfada min tesdîq kirin 0 gotin ku eger Zahiro tifınga min nekişandaba ez direviyam û ev misfl>etnedihate serê wi. Li ser xwestina fennandar, îşê min bi derengî nexistin û ez berdam. Lê merivên Zahiro dawa xwinê li min kirin û li kuştina min digeri-yan. Êdî min nedikarî ez li.wan deran bisekinim 0 Karê careke dî bibînim. Merivên wê ew bi xwe re bir ...
130

14- Li TIrkiyê

Siyabend û Xecê

Li ser şîreta fennandar ez bûm tercimanê Alaya 1 a Kozakên Labînskî û çûm eniya Tirkiyê.

Li gundên ku ketibûn destê Rûsan teqrîben xelk li ciyê xwe mabûn. Ezab û işkence ku ji aliyê zabit û eskerên rûs bi wan dihatin kirin, min bi çavên xwe didîtin. Leşkerên Çar wa bawer dikir ku li şer her tişt mesml1h e: talana malê xelkê, şikênandina irza jin 11 keçan ... Da ku xwe biparêzin, gelek jin dest bi şerê canî 11bêbextan kir 11ligora adetên kevin, xencer di dest de, bi mêranî naml1sa xwe parast.

Hadiseyek hin di bîra min de ye: di vê minteqê de, ligundê Kêrik, pîrekekji e.şîra min hebl1. Ewê di mala xwe de çete yeke jina pêk anîbl1l1 nedihişt ku zabit û esker bikevin hundirê malê. Di gel vê yekê, zabitên xort aşiqî vê delala şerevan bl1bûn 11gelek dixwestin ku wê bêxine destên xwe.

132

Zabitên rûs di herbê de gelek pere distandin û gava lieniyê lihevxistin disekinî, xwe didan sefaheteke mezin. Bi rojan ve, nemaze bi şev, diketin vexwarin û qumarê. Serekên wan ew didîtin bêî ku dengê xwe bikin, herwekî ev tişt gelek adetî bûn ...

Carek piştî vexwarinekê, di şeveke xweş de ji yên havînê, çend zabit xistin serê xwe ku bikevin mala jinên kurd ên asê. Gava deriyê hewşê girtî dîtin, xwestin di ser dîwarên bilind re bikevin hundir. Za-

bitekî xwe bilind kir da ku derkeviyê. Van serxweşên ha wa dizanîn ku di mal de tu peya nîne, lê gava ku tifıngek li wê teqiya û berik di ser serê zabit re derbaz bû, şebqa wî qul û serê wî jî hinek birin kir, pir şaş man ... Zabit di cî de ji dîwêr hate xwar û careke dî newêri xwe nêzîkî wî bike. Lê, yekê din xwest mêraniya xwe nîşan bide û çû ku ji wî alî derbazî hindurê malê bibe; tifingeke dî hate berdan, û zabit bi milekî sivik brindarbûyî, pol, poşman, vegeriya cem hevalê xwe ... Ji nîşandariya pîrekan ecayibmayî û ji tirsa ku dengê tifinga bigehe guhên dewriyeyên alayê, zabitên me dest vala û sernizim vegeriyan ciyên xwe.

Piştî çend rojên din,ji nû ve avêtin ser vê malê. U dîsa, zabitê ku dixwest bibihure cem jinên kurd ji aliyê tifıngvanên veşartî derbek li milê xwe xwar û bi lez xwe bi şûnde da.

îcar, yekê raporek da Erkanê Herba Ordiyê. Di cî de, zabitekê inzibatê ji Ordiya IV a Qefqesê bi çendekên din re hate wê derê ku têhqîqatê bike. Ez jî di

134

vê encimenê de terciman bûm. Gava em gihaştin mala jina kurd, zabit di pêşiyê de ez şandim da ku ji pîreka re bibêjim ku ev encimenji bo parastina wan hatiye. Ev giş bi roj çêdibOn Q gava gihaştim mal, li ber den tifingek dirêjî min bû, lê min bi kurdî gote wan: «metirsin ezji we me!» Hiştin ku ez bikevim hewşê û piştre hundirê malê bi xwe. Hingê min dît ku şervanên

me çar pîrek bûn: xesû Qher sê bûkên wê. Sereka çetê, bi rastî jinekeke spehî, bûka piçûktir bû; her du bûkên din û xwesQ libin emrê wê bûn giş bi tifing û rext. Min gote wan ku Mezinê eskerî yê bilintir hatibû tehqîqê; dixwest rastiyê bizane da ku yên bi sûc ceza bike. Pîrek çOn mezeleke dîtir ku bi hev re şewrê bikin. Yek ji wan tifinga wê bi dest û li min dirêj kin, li ber derî sekinî. Piştî ku qederê nîv saet, bi hev re axaftin, vegeriyan û li ser niyetên heyetê ez dam sondê. Min jî bi ya wan kir, sond xwar. Piştre heyet hat û ji hemû jinan, ji hin zabit Q eskeran, pirsan kirin. Evan gazinan ji wan jinan dikirin û gelek tiştên xirab di heqê wan de digotin.

Ji pirsiyarê, pir fêlên zabit û eskeran ên nebaş derketin meydanê. Dawiyê, hin zabit hatin rêkirin yekîneyên din, Qji bo parastina jinên kurd jî, nobetçî hatin danîn li ber mala wan. Lê, pîrekan baweriya xwe bi wan netanî û nedihişt ji min pêve tu kes bikeve mala wan.

Çend hefte bi şûnda em hîn bêtir ketin nav Tirkiyê Q gihaştin çiyayê Sîpanê ku bi bilindahî ji Agirî ne kêmtir e. Çiyayê Sîpanê yê muhteşem, çiyayê

136

(Siyamend û Xecê) ku li wê çend car min strana wan bihîst. Bi kurti çîroka wan eve:

Di wextê berê de, nêçfrvanek keleş, ji eşfra Zillî, li serê çiyayê Sfpan diji ; navê wi Siyabend bO. Dilê Siyabend kete Xecêya bedew. Lê ew belengaz bO,

diravê wi nebO ku qelen bide bavê Xecê. Loma rabO Dedewa xwe revand, bir serê çiyê. Li wir bi xweşi û bê xem sê roj û sê şevan derbas kirin. Roja çaran, Siyabend serê xwe dani ser çoka Xecê û di xew re çû. Wê gavê, çend pezkûvi di ber wan re derbas bûn û yek ji wan, yê mestir û spehl't.ir xezalekê rakir û xwe tevl' wê ji keriyê da alî. Gava Xece ev dît, gin pê ket û hestirêk ji çavê wê ket ser TÛyê Siyabend. Ew şiyar bû û dît ku Xecê digrf, jê re got :

- Eger te bê dil ez kirime, ezê bi te re êdiwek xwişk û bira bim û ezê te bibim mala bavê te.

- Na, Siyabendê min ê delal, ezji te hez dikim û ezê timi ji te re jineke sadiq bim, lê ez digrim ji ber ku min dîl çewa pezkuviyek spehi û mezin xezalek ji nav keriye rakir bêî ku tu pezkûvî yê din biwêribe li ber wî rabe. Ev pezkuvi jî wek te mêrxas e, mêram ya te hate bira min û ezji ber dilşayiya xwe ya pir mezin giriyam, lê vegerand Xecê.

Siyabend hingê jê pirsî :

- Ka ew pezkuvî û xezal çûn ku ?

Xec€; şani wî da ew bi kijan ali ve çûbûn û Siyabend gote:

- Ez rıêçfrvan im. Ez li serê vi çiyayiji xwe xurtir tu kesî nas nakim, çewa pêzkûviyek li ber çavên min xezalekê ji keriya wê direvîne : ew ji min re TÛresîye !

138

Ew ciy€ xwe rabu 0 da pey pezkuvi. Çewa n€zİki

wi bO, bi tirkevan€ xwe nişan l€ giıt, l€ pezkOvi xwe ayet ser wi bi daren xwe l€ da 0 ew av€te koıtal€. Xec€ wi li wir brindare xedar dJt. Ew di bin koıtal€ de vezeliyabO 0 Xec€ xwe bi sr wi ve xwar kir, dest bi girfneke tehl kir. Ew€ li bedewiya dar 0 beran, li ku1flkan, li hemO ihtişama xwezay€ lanet dibarand ; ewe li ava kaniy€, li deviyan, li meywan 0 li vi giyaye ku pezkOvixaribO 0 pe gihistibO v€ qeweta ku hişt bi ser Siyabend bikeve lanet barand. Ji beh€vftiy€, ewe li s€rey€n zozanan €n ku di heşinahiye de xeniqfbOn, li hewa xweş a tji behna kulilken çiya 0 li taa tOj a ku Sfpane Xelate, ware vipezkOvi ye xirab, roni dikir lanet barand.

Siyabend 0 Xece yekji çiroken kurdî yen xweştir spehftir e.

o

140

15- "Ez hêvî ji we dikim, mebin qurbanên derbên min!"

Vegera min a mal

Li ber çiyayê Sipanê em gelek neman, pişti çend rojan, ji serfennandar emir hate me ku em bi pêşve herin. Belê, li ser serdestiya ordiya ras eniya şer gelek çilba pêş. Zabitekî, çend Kozak il ez ji bi xwe re birin il di pêşiyê de derket. Diviyabû, beri hatina esker, em ji qerargehê re ef,ji esker re xwarin û ji dewaran re ji êm peyda bikin.

Gava di quiıtara çiyaki re ber bi jêr dibûn me Kurdek di direviya û 10-15 peya ji li pey wi, dida ser û tifınga berdidanê; lê berikên wan gi vala diçûn. Firar tim diziviri û digote wan:

- Ez ji we hêvî dikim, bela xwe ji min vekin û mebin qurbanên derbên min. Ji min çi dixwazin? Ev meseleke bori ye.

Mêrik baz dida, şireta li wan dikirin, il gava guh nedidanê diziviri wan, bera wan dida il di her derbê de yek ji dijminên xwe dixiste erdê. Kozakên me tev de,

me bêbextiya Fermandariya Bilind bû û li bendê bû ku şer rojek zûtir xelas bibe. Gelek ji wan ji eniyê direviyan.

Her çend em nêziki cephê dibûn, rewşa me xirabtir dibû. Min xiste eqlê xwe ku ez xwe ji wezîfe derêxim. Meaşê pênc mehan dan min û di cî de min berê xwe da gundê Astaflû (li minteqeya Sûrmelî, tabiî Erîvan) û welatê bavê min.

Gava ez gihaştim mal, min xelkê xwe di perîşaniyeke mezin de dîn. Du sal dûrketina min ji mal, ew ji xebatkarek mehrûm kiribûn û îşên wan tevlihev bûbûn. Di vê nebûna min de li mal, çavên diya min êşiyabûn; her wekî doktor nebûn, çûbûn cem hekîmê kurmancî; ewan jî çavên diya min ewqas baş derman kiribûn ku rebenê hema kor bûbû. Ew bi zor roj û şevê ji hev dineqand, tiştan xirab ditît û nema êdî bi kêrî îşên

malê dihat. Her du xwişkên min kebaniya malê dikir. Bavê min jî, rexma pîrî û êşên xwe, dîsa diçû ber dewarên xelkê.

Gava ez ketim hundirê malê, diya min ez ji dengê min nas kirim. Xw.e avête min da min maçî bike; nedihişt ku tu kes berî wê nêzîkî min bibe. Rebenê nedikarî cilê min ê eskerî bibîne; destên xwe li ser min digerandin û kêfa wê bi bedla min a eskerî û bi bişkokên wê yên mezin dihat. Piştî ku ez têra xwe himbêz kirim, diya min hişt ku xwişkên min jî bên silav li min bikin.

Xebera hatina min zû li gund belav bû. Meriv û nasên me hatin xweşhatina min. Bavo ne li mal bû,

146

destek fişek berdanê û li lingê wi egfdi xistin. Mêrik mecbûr bû xwe bide dest

Di pirsiyarê de hate zanin ku ev zilam, ji bo hilanfna tola xwa, ketibûn dû vi peyayê hêja. Firar ku, bi mêranf û nişandariya xwe em heyin hiştibûn, çûbû gundê kuji zûda li wê merivek kuştibû. Merivên kuştî wi dibinin û herweki dizanin ku ji malbata wi tu kesê ditir nemaye, didin pey ku wi bikujin. Qatil ji gund direve û ji tifinga xwe bawer, ji dijminên xwe natirse, heneka xwe bi wan dike û ji wan re dibêje: «Qurbanên berikên min mebin, bela xwe ji min vekin!». Ewên ku ketibûn dû wi giş hatin girtin û rêkirin ber hakimê Melazgirt, nû keti destê Rûsan. Bnndar ji hate danin xestexaneya esken; li wê, pişti ku bnÎ1a wi bi timami

rahet bû, disa vegeriya mala xwe.

Jiyina min li eniyê, bi vi awayi derbas dibû: çûn û hatinên dayimi di nav gundan û warên koçeran de. Zivistana sala 1915-1916 nêzîk bû. Halê minji pê re dijwartir dibû; serma dest pê dikir û ez difikirim vegerim mal. Di vê wextê de, gelek eskeran ji malên xwe xeberên xirab distandin. Ji wan re dihate nivisandin ku ji ber seferberiyê, xelayi hebû, tu kes li gundan nemabû ku bi çandiniyê mijOl be. Ji wan re dihate nivisandin ku dest datanîn ser pez û dewaran û ew seıjêdikirin, ku malbatên eskeran, zaroyên wan ên piçûk birçî n.e. Mektûbên wilo eskerên ji vi şerê dirêj westiyayî gelek xemgin dikirin. Dihate gotin ku li Eniya alman rewş roj bi roj ber bi xirabiyê diçe û bi deh hezaran, sed hezaran birîndar di xestexaneyan de bê xwedlû' ane. Hemû bawer dikirin ku sedemê şkestinênm
144

çaba ber golikan. Xwişka min çO xeberê bidiyê a li ber garanê rOnê da ku ew vegere mal. Rexma pirbOna xwe, bavê min, bê sekin, bihinçikandi 0 çav bi hêstir, bi lez hate mal, ez himbêz kirim a gote min:

- Çima te ez berdam? Ez êdi pir hOme 0 nikarim herim ber dewêr ... !

Piştre rOnişt, bêhna xwe kOrkişand 0 bi girînê ket. Hingê, min heştê rObi1ên xwe derêxistin, danê a got:

- Evê ji bo zivistanê, têra we bikin.

Gelek kêfa bavê min hat: ji bo wi, her weki

elimibO kiri yên bê qiymet, heştê rObi1 xezneyeke mezin bOn.

Qederek ji payizê derbaz bObO 0 çêreyên havînê digihaştin dawiya xwe. Min ciyê bavê xwe girt; da bihêlin çend rojan xweş rahet bike.

Min tarikê xwe yê kevin bir 0 dîsa çOm çolê, ber golikan. Bi xwe pişû çend rojên din berf daket, çêre êdî neman a ez vegeriyam mal. Ez çend rojan di nav xelkê xwe de mam 0 piştre li şixul eki fikirim.

148

16- Di partiyê de

Min izna xwe ji mal xwest û berê xwe da bajarê Saıîqamiş. Li wê, ji bo xebatên avahiyê di Drûjana 6 a de (tabûra ihtiyatan), ez bûm emele. Pişti çend rojan, gava serekên min bihîst ku ez bi çend zimanan dizanim ez disa kirim terciman.

Drûj ana me ber bi Erzerûmê ve.,ku di meha sebatê de ketibû destê Rûsan, rêhesina teng çêdikir. Di vi karî de, ji her miletan, Kurd, Ermenî, Tirk, Oset. .. çend hezar emele dişixulin. Ji van pêve, ji Moskova û bajarên Rûsya yên mezin ji, gelek Rûs hebûn ku ji bo karên eskeriyên pişt Cephê hatibûn seferber kirin. Min ji wan gelek naskirin û bi Ki1imov, Mixailov, Popov, Şûrka Komev re ku piştre min li Moskova di, ez bûm dost

Ji Komev pêve ewên din giş endamên partiya Sosyal Demokrat a Bolşevik bûn û di teşkilatên veşarti

de dixebitin. Kêfa wan bi min gelek dihat; ez kirim hevalê xwe û ez pir caran dibirim civinên xwe. Heya wê gavê, haya min ji civatên veşartî nebû. Cara pêşin bû ku ez rasti xebatkarên sewrewi (şoreşger) dihatim. Di civinên xwe de endamên civat ji min dixwest ez ji
150

emeleyên ne rus re bibêjim ku pir guh nedin şixul û zêdekirina kiriyên xwe teleb bikin. Min li ser xwe girtinên gihandin emeleyên kurd, tirk û yên dîtir ... Ewan jî di ef de gotinên me ecibandin û xwestinên xwe beyan kirin ku, bi tercimaniya xwe min gihandin ciyên berpirsiyar. Meqamên bilind serên xwe di ber xwe re berdan, liber xwestinên emeleyan serê xwe danîn û hin bi hin kiriyên wan zêde kirin.

Emeleyên Moskova ji min re neşriyatên şoreşger didin ji bo xwendinê. Bi saya xwendina van kitêban û tim û tim bi dîtina endamên partiyê, hêdî, hêdî min li ber xwe didît û ji bo azadi ya miletên bindest û xilasi ya feqîr û xebatkaran ji bin istimara xwedî milk û dewle-menda, dibûm şeravanekfbêtirs û serhişk. Berê, ferq di navbera Bolşevîk û partiyên din de çi bû, min nedizanî, lê, min hez dikir ku hemû şoreşer qewetên xwe bikine yek û tevde ji bo armancekê bixebitin : rakirina istibdad û zulm, sekinandina şer, xilaskirina feqîr û xebatkarên ji bin tehekûma sermiyan, ango ji ya dewlemenda.Min gumanên xwe gotin hevalên xwe. Kilfmov dûr û dirêj bi min re axaft û piştre kitêbeke pir

mezin da min ku min bi diqeteke kûr xwend. Paşê, ez çûm civînên Bolşevîkan di nav rêla da, li wê ji bo qulibandina hikûmatê Bolşevîk xwe pêk tanfn. Tenbîhan li min kirin ku ji tu kesî re behsa van civîna nekim yan na polîs wê bihatana me û em giş bigir-tana ...

Bi vî awayî, hin bi hin, pêşiya min firehtir bû; xebata teşkîlatên partiyê ez bi xwe re kişandim û min xwe gihande Bolşevîkan.

152

BIRA DIWEMÎN

1- Sala 1917

Kela şahiya rojên sibatê xwe danî.

Bêmanabûna şer ji her kesî re êdî eşkere bû, lê dîsa, di gel vê yekê dom dikir. «çar êdî nemaye, lê ... HikûmataMiweqethikimdike.»Ûalayên nû rêdikirin eniyê.

Li mîtîngan, Menşevîk û SR (Sosyalîstên şoreş-ger) xwe tev didan û armancên xwe bi qîrîn belav dikirin: «Şer heya serdestiya dawîn!»

Esker, li ciyê xwe melûl û dilşkestî diman, bê deng guh didan gotaran, bê dil û bi sistî diqîrin "bijî", û diçûn eniya şer.

Û li eniyê, grûyan (qitea) êıîşa dijmin nedibir û dixwest ku wan vegeıînin welatê wan, Rûsya.

Feımandaıî, ji bo îtaeta wan, Kozak û Jûnkeran (xwendekarên xwendegeha Şer) rêdikirin. Ji Rûsya, di

ser çiyan re xeberên bêbextî û birçîbûnê, dihatin.

Xeyid, gilî û gazinji eniyê digihaştin paşiya wê û di nav esker û emeleyan de, belav dibûn.

154

Di nav vandilêşîO gazina de, zerûriyeta bi tehdîd xwe da bihîstin ; « Êdî şer rawesûnin! Me vegerînin mal!»

Drûjana me ya 6 an a Qefqasya ya Komela bajaran hingê liSarîqamîş dixebitî. Di nav me de gelek A1manên ROsya hebûn, lê herwekî hikûmata Çar bi wan bawer neba, çek nedida wan û ew di îşên avahî 0 çêkirina riyan de didan şixulandin.

Cejna Yekê Gulanê, jî nêzîk dibû. Teşkîlata Bolşevîkan a bi dizî jî ku ez tê de bûm, bi dil 0 can xwe ji vê rojê re pêk tanî. Me qerar da ku emê seyranekê gulanê û mîtîngekê pêk bînin, rêçika Bolşevîkan bidin zanûı û ji esker 0 xebatkaran re, çima Hikûmata Miweqet şer nedisekinand, bidin fehm kirin.

Armancên me ev bOn : «Rawestandina Aşftiyeke bê ilhaq û terxîskirina ordiyê !.»

şer !.

Wek endamê teşkı1ata bi dizî, karê min ew bû ku ez di nav xelkê bajêr de beyaname û gaziyên komunfstan belav bikim.

Bi kincên min ên kurmancî, tu kes ji min bi şibhe nedibû. Bi kum 0 qeftanê xwe ve, serbest, ez li nav bajêr digeriyam û li ciyên ji berê de tayin bayî, ez rastî

hevalên xwe dibûn, beyaname û kitêbokan didan wan.

Bi roj em di nav rêlê de dixebitîn 0 êvarê ez vedigeriyam bajêr.

Carekê, gava berîkên min tije beyaname ez ji holika xwe derdiketim, li ber sênca rêlê rastî hevalê

156

xwe yê On1jana, Alman Şineydir hatim. Min bala xwe dahı1ku, ew her gav, her wekî bi tesadifi, liwê, rastfmin dibı1, heya ez ji ber çavên wî winda bibim li min dinêri', her wekî dixwest min ji cası1san biparêze.

Ez sekinîm ı1bala xwe dayê. Ew kenîı1 nêzîkî min bı1:

- Tu diçî? Ewî gote min ı1li dora xwe nêri'.

- Ez diçim. Û tu jî, ji xwe re digerî? ...

- Ez digerim, Şineydir kenî : Şamil! min jî bi xwe re bibe!

Oiltengî nîşan da ı1sor bı1.Min baş li çavên wî nêri' ı1 gotê:

- Bi ku da?

- Bajêr. ..

- Çima?

- Ezê bi te re bim. Ez dizanim ...

- Tu çi dizanî"? Bêje ... !

Şineydir kenî.

- Metirse xeber bide!

- Ezê ji çi bitirsim? Ez dizanim ... Ez ji zûda dizanim, hêdîka gotê guhê min ı1 destê xwe li beri'ka

min xist. .. Here, Şamil, bi dilekî xurt here! Ez li vir im ...

Û Şineydir, bi fikandinê, di ber sêncê re meşiya.

Ez ketim du wî, ew girt ı1gotê:

- Şineydir!

- Çi ye?

- Te gotiye hinekan?

- Tu dîn î ... Gelo yek dikare vî tiştî bibêje her kesî?

- Here!

158

Ev di şeva Yekê Gulanê de ba. Min ji wê bi şilnda êdî Şineydir nedît. Gava ez gihaştim bajêr, min beyan-nameyan dan hevalekî xwe ku libenda min bû, û berê xwe da stasyona Sarîqamîş da ku bikevim nav eskeran ku, ji bo bihîstina xeberên Rûsya, li wê kom dibûn.

Li stasyon min lihevgihaneke mezin dît. Bi nêzîkayî, hemû lekên leşkergehê li wê kom bûbûn. Meydana li ber stasyon tije xelk bû. Civîn li ser vî tiştî hatibû xwestin: pakêtên ku ji es~eran re ji Rûsya hatibûn rêkirin, di rê de riziyabiln, a gava gihaştibûn Sariqamîş, mudîrê stasyonê ew ji wagona avêtibûn, ji ber ku êdî bi kêrî tu tiştî nedihatin.

Timam di vê gavê de, yekînekê rêdikirin eniyê. Eskera pakêtên riziyayî dîtin, ji enira xwe çûn li mudîr xistin a mîtîngek pêk anîn. Qebûl nedikirin herin cephê û dixwestin ku wan vegerînin malên wan. Gelek

diaxaftin a sergm bûn.

Gotarên wan gelek tesîr li min dikir. Bi lerza şabûnê ez dilerizîm. Dilê min pir dixwest ku ez derkevim pêşiya van eskeran ku bê rawestan xwe tev didan. Quweteke nenas, ez ber bi sendûqan ve ku min-berek pêk tanîn, avêtim. Nêzîkî minberê, eskerekî ez sekinandim :

- Bi ku da diçî ?

. .... - Bra, ez dixwazim xeber bidim, ez bolşevîkım

,

160

Ken1' 6 destê xwe da min. Ez derketim ser send6qê. Li wê qiyafeta min a kurdî, bi kum 6 qeftan, eskeran eleqedar kirin. Li dora min herkes xwe ker kir.

- Xeber bide, esker gote min, lê bi dengekî bilind, da ku herkes te bibihîse!

Bi qetandin 6 nîq6rçikirina pirsên rusî, min dest bi axaftinê kir, 6, di nav çend salên dawîn de, min çi dîb6n 6 his kiriMn, gotin wan. Min gote ku berê Çar em dixeniqandin, lê niM, li ş6na wî, bajariyên dewle-mend, beg 6 axa me dixeniqûıin 6 me rêdikin mirinê. Divê ku em wanji hikim bavêjin 6 vegerin malên xwe.

- Ev Tirk e! Zabitekî lewtelewte kir, derket ser minberê 6 hate min.

Eskeran lê kir qîrîn: «Destê xwe dirêjî wî meke!»

Ez ji ser send6qê hatim xwar 6 di nav xelkê de winda b6m.

Mitîng heya miqdarekê ji şevê jî dom kir.

Bi şev dereng,ji tiştên ku min kirib6n kêfxweş, di kolana stasyona teng re, e~ vedigeriyam holika xwe 6 min ji xwe re hêdî, hêdî straneke kurdî digot. Ji nişkave, ji paş min reperepa lingê zilaman hat. Ez sekinîm.Çend meriv dab6n d6 min.

- Va ye ... ! Zabitê ku ketiM pêşiya wan kire qîr, 6 di destê wî de tiştekî giran diki1a.

Bi wî li serê min xist. Bê hiş, ez ketim erdê ...

Di hebsa Sari'qamîş de, di hicreke piç6k de, min çavên xwe vekirin. Nobetkar kete hicra min. Gava di't

162

ku min bi nalîn serê xwe ji erdê hildikir, pehineke hişk li rûyê min da û got:

- Tu dîsa hatî hişê xwe, ne? Sa, kurê sa ... !

Ez dîsa ketim erdê ...

Di hiera xwe de, çend rojan, ez bi tena xwe mam. Piştî pirsiyarê ez birim cem girtiyên din. Li wê, çend esker hebûn, di nav wan de, bi navê Nîk:olayev, zi-lamekî rîspî û xwende jî hebû, xwediyê nifûzek mezin bû li nav girtiyan.

Gava bihîst ku ez di mîtîngê de hatibûm girtin, Nîkolayêv ji min re dest bi dayina şîretan kir, da ku di pirsiyarê de, çi û çawa cewab bidim. Lê, hevalên min, ji berê de, rê şanî min dabûn da ku ez wan nefroşim.

Ez birim cem hakimê pirsê. Ewî, di mîtîngê de min çi gotibûn, ji min pirsîn. Di bersîvên xwe de, bi

rûsiyeke çat-pat min jê re tiştên tevlihev gotin.
/'
Hakim qîr dikir û lingê xwe li erdê dida.
- Xwe li kerîtî daneyne ! Te di mîtingê de behsa Bolşevîkan kir?"
- Bolşevîk? .. U min şaş lê nêrî.
- Tu Bolşevîkan nas dikî?.. Hakim bi dengekî bilind qîr dikir min û şeş derba xwe dida sîngê min.
Ez dikeniyam û serê xwe dihejand.
- Bêje ...
- Ez Bolşevîkannas dikim!Miletekî 'mezin...Dibê lazim e şerê Tirkan bête kirin ...
- Divê herkes heriyê ...
/
164

Hakim tif dikir, xwe hildavêt a bani nobetdaran dikir ku li min xin.
- Bêje ... Hakim dîsa qîr dikira şeşdeıba xwe liber guhê min digirt. Lê, bi girîn, min dîsa digot: Bolşevîk, miletê mezin, şerê Tirk dixwaze.
Piştî ku bi min re çend rojan kişkişandin, hakim qani bû ku xeletî çêbûbû a li hebsê, yekcar ez ji bîr kirim a di destpêka hezîranê de ez berdam.
Ez di ef de çûm civata xwe. Hevalan, mayina min liwê minasib nedît; di wê rojê de, ez vegeriyam welatê bavê xwe. Gundê me, Sûsûz (Bêav).
166

2- Li Gund

Li welêt tu tişt neguhirîbt1. Wek berê, Walî hın "Xwedê t1 Çarê" minteqê bO. Wek adetî, çawişê cendinne Kurdan davêtin ber daran t1mal t1 pereyên wan dixwar. Kurd jî hın xwe bê deng dikir t1li ber zilamên hikt1matê xwe heya erdê ditewand. Nedizanîn ku li Rt1sya inqilabek çêbt1ye t1Çar êdî ji zt1ve nemaye.

Min gundiyên xwe civandin t1li Rt1sya çi çêbt1bt1 gote wan. Gundiyan bi tirs guhdariya min dikir t1kala, bi pistepist, şîreta didan min:

- Bala xwe bide, Ereb! Hakim wê bibihîse t1belaki bîne serê te! Û ez berdidam t1diçt1n malên xwe.

Mezinê gund, Cindiyê Emo guh li gotinên min bt1. Hate cem min t1bi çawişê cendirme ez tirsandim, eger ez dev ji Kurdan bemedim.

Gotinên min vala neçt1n. Heta berî hatina min jî,

168

liser azadf (l parkirina erd (l milkan, hin gotin gihabOn gundiyan, lê Kurd ji hik(lmetê ewqas ditirsiyan, nediwêrfn ji kê ku bO, tiştan bipirsin.

Lê, li gundê me bi xwe, ji min re hevalek derket. Ev, bi navê Morovê Emo, gundiyekf feqfr b(ı. Li serê çiyan, me bi hev re, çend şev derbaz kirib(ln (ıli ser fşên dinê (ljiyfna xwe, axaftib(ı. Minjê re qala Bolşevfkan kiriM (l gotiMyê ku ev ji gundiya re serbestf (l erd dixwazin. Morove guhdariya min dikir (l ji şahiyê

çavên wf yên reş ên mezin diçirisfn. Em bi hev re di zeviyan de digeriyan ; Morove bi tiliyên xwe, şam erdên bi genim ên bê hed (l hêsab ên Şewerş dida (l ji kêfxweşî bihnçikiyayî, digot :

- Ev erd jf, wê yên me bin ...
- qiş ême ne. Emê her tişt ji destê wf bistfnin ...
- U pez (l dewar?
- Ew jf wê bikevin destê milet. ..

Morove dikem (l wek zarokekf piçOk xwe hildida:

- Divê ev tişt, rojek beri rojeke; çêbibin.
- Em bi tena xwe nikarin. Divê milet tev de xwe rahije vf karl ... Min gotê.
- Gundên Gomesoro (l Qerekele bi xwe wê bibin ên her kesî? Lê eger erd têr neke? ..
- Erd wê têra me gişan bike, min dilê wf rahet kir ...

Carekê, ewî gundîkî xweşhal, Cindiyê Ûso, ani.

- Er~b, ewf gote min, tu dibêjfku erd ê her kesf ye?
- Belê.
- Û me divê ew ji xwedf milkan bistfnin ?
- Belê.

170

- Û hikamat? Ew erd nadê me ...
- Emê ji xwe re hikamata xwe deynin.
- Eskerên wan hene.
- KI"?
- Serekên me.

- Ême jî çiyayên me hene ...

Cindî ponijî, 0 bêî ku tiştekî dî bibêje, serê xwe nizim kir 0 vegeriya gund.

Roja dîtir dîsa hat:

- Ereb, tu îsrayil Mîrakiyan ônasî?

- Belê ez wî dinasim.

- Ez li cem wî bAm. Cindî sekinî 0 li çiya nêrf.

- Te tiştek gotê?

- Belê.

- Mamoste îsrayil Mîrekiyan çi dibêje?

- Ew jî wek te dibêje, Ereb. Cindî xwe lal kir, piştre bi dengekî nizim bi ser de ajot:

- Ez çAm Qerekelê.

- Kurd çi difikirin li wê?

- Erd dixwazin.

- Erd dixwazin? Şaş min tekrar kir ...

- Belê, li Qerekelê 0 li Gazacan, gundî behsa erd dikin ... Bêje, emê çi bikin?

- Min got. ..

- Serekê xwe biqewirfnin?

- Belê ...

- Ew car din çO. Morov li riya wi nêrf 0 fikand.

- Çiyê te heye ?

- Ewê bi me re bibe, Cindiyê Ûso, wê bibe hevalê me ... , gote di ber xwe de.

172

Belê, Morov xwe nedixapand. Cindiyê Ûso bû

hevalê me, 0 piştî wî pir gundiyên dîtir jî ketin şopa wi.

Roja ditir, serê sibê zû, siwarek bi lez hate gund, bi qîrqîrê çO mala mezinê gund.

Di ci de Kurd li dora wî kom bûn.\..

- Muxtar! Siwar, bi dengekî bilind, ban kir, axa emir daye ku gundî giş herin mala wî, ji ber ku îro amirek mezin wê bê cem wî û we giş dixwaze ...

Cindiyê Emobiitaet serê xwe xwar kir.

- Ji bona çi? Hinekan li dorê pirsî.

- Metirsin, siwar bi ken vegerand. Nihu, êdî serbestî ye. Axa nema dikarin zilim bikin. Piştre qîr kir hespê xwe, ew rakir telebê û berê xwe da çiyê.

«Serbesti? Axa êdî zilim nakin! ... »

«Herin cem axa, Morove digo, nihu azadi ye! ... »

- Zimanê xwe pir dirêj meke û bala xwe bide gotinên xwe! Cindî yê Emo gotê û bi tilî ya xwe ya xwar ew tehdîd kir.

Herkes hiş bO. Emo, bi awirên t6j, lî dora xwe nêrî, lêvên xwe yên qenniçî lî hev xistin 0 got :

- Herin, lê bi tertîb, we seh kir?

Gundiyan da rê û bê deng ber bi çiyan ve meşiyan.

Li gundê Dîgorê mezin, bi nêzîkayî, hemû xelkê minteqê civiyabûn. Nemînendeyên hemû miletên ciyê me lî wê bûn.

Nemînendeyê Hikûmata Miweqet, gotarek da. «Sewreyek li Rûsya hatiye çêkirin, ewî digot. Çar ne-

maye, 0 êdî, milet ji aliyê nemînendeyên xwe tê ger-
andin 0 li ser wan jî HikOmata Miweqet heye.»

- Û erd? Morove kire qîrîn.

Pirsa «erd» weke barûdê, agir girt. Bi sedan ve deng ev pirs tekrar kirin.

Gotarbêj zor da xwe ku dengê gundiyan bide birîn; lê tu kes guh nedidayê. Ji bihntengiya xwe çO cem mezinekî kurd ê gelek bi nifOz, Egîd Beg.

Ez li nêzîkî menberê bûm 0 guh bi gotinên wî dibOm :

- Ev xwestin ji ku ketine nav Kurda?

Egîd Beg bi çav ez nîşan damê.

- A! A! Nemfnendeyê Hikûmatê mirmirî, û bi diqet limin nêrî. Ez bi cilê eskerî bûm. Piştre devê xwe da guhê Egîd Beg, 0 tiştek pistepist kirê. Egîd Beg bi giranî serê xwe hejand 0 banî çawişê cendirmê kir. Ewî jî, bê deng, temaşa min kir, 0 bi işareta teyid serê xwe bir ber xwe.

- Ereb, derkeve, Morov bide! Morove bi lez hatî cem min, digote min. Hevalên me hêvî ji te dikin ku tu ji wan re gotinên xwe yên gund bibêjî. Li benda te ne, zO bike!

Bi lez, ez derketim ser menberê.

- Firarê eskerî ... Nemînendeyê Hikûmata Mi-
weqet, di nav diranên xwe re fıkand 0 xwe ji min dûr kir.

Guhdar bê deng ban.

- Hevalino! Bi dengekî bilind min dest pê kir.

- Ereb ... Ereb ... Ev nav di nav koma guhdaran de ji devê herkesê derdiket.

- Em gundî, mihtacî erd in. Û erd, Bolşevîk wî didin me. Ew dibêjin: «Ji şer re dawî, ji xebatkaran re febrîqe û karxane, ji gundiyan re erd!»

Gava min his kir ku yek bi milê min digire û min ber bi xwe ve dikişîne, min xwe zivirand û min destê Nemîndendeyê Hikûmatê li ser xwe dît:

- Dengê xwe bibire ... Yan na? Ewî xwe tewand ser min û ji guhê min re mirmirî.

Rûyê wî ji xezebê sor bûbû.

- Wî berde! Bira xeberbide ... ! Çima tu wî nahêlî? Gundiya ji nû ve lê kire qînîı.

- Bibêje, Ereb, bibêje ... !

Gava min dî ku gundî diqîrin, mîtînga eskeran û hebsa Sarîqamîş hatin bîra min. Ez dîsa li wan zivirîm. Nemîndeyê Hikûmatê, xurt milê min girtibû ji hêrsê dilerizî. Egîd Beg bi çavên tije kîn û tinaz li min dinêrî. «Ne xema min e !»~min ji xwe re digot.

Min milê xwe ji destê wî derêxist û dom bi gotara xwe kir: Cendirme, xwediyên milk, dewlemend û axa, Kurdan davêtin ber daran ûji îro bi şûnda jî, ewê liwan xin eger Kurd hukm nexin destên xwe û erdên xwedîmilkannestînin. Divê em sovyetêngundî, emele û eskeran bibjêrin. Divê em gundiyên kurd ên feqîr bibjêrin.

Gotinên min ev bûn.

- Na! emê hikûmateke mehelî 0 miweqet deynin, lê, ne sovyetan! Nemînende kir qîr, 0 ez dehf dam alM. Min his kir ku destekî giran milê min digivaşt. Ev Egîd Beg bi xwe bO.

- îşê min bi te heye, Ereb, ewî gote min.

- Tu gotinên min bi te runin, bi xeyid min vegerandê, 0 milê xwe ji destê wî fılitand.

- Ciwaba te eve, Ereb?

- Bi gurekî re yek an bi agir an bi berik, xeber dide, min gotê, ji ali yê wî de tuf kir 0 ji menberê hatim xwar.

Civîn, heya derengiya şevê dom kir. Gelek hele-hele 0 deng hebûn. Nemînendeyê HikOmata Miweqet, ji hemO xwestinên Kurdan re mazereta dîtin û bi cîhanîna wan li ser xwe girt. Lê, gava intixabat çêbOn, hemû namzedên Taşnaq 0 yên began derketin. Namzedê me, îsrayn Mîrakiyan ket. Di dema esasî ya dengdanê de, ew mecbOr kirin namzediya xwe bikişîne.

Di tariya şevê de, ez vedigeriyam mal. Ewrên giran di ser çiyan re hêdî hêdî derbaz dibOn. Car car, heyfv wek dasekê di pişt wan re rûyê xwe yê şên ruşan dida. Ez di şivereyeke çiyan re dimeşiyam û hevalên min ên bolşevîk, ku li wê, di bajarên rus de, dixebitin, dihatin ber çavên min. Ji nişkave, ji tariyê, sê zilaman xwe avêt min: «Kemînek danîn ji min re ... », min ji xwe re di dilê xwe de got. Çiqas ji min dihat, min kulmek li

rûyê yê pêşîn xist. Min li destê xwe tiştek zeliqok his kir ... Xwîn!
180

- Kurê sa! Mêrikî lerizî qîr kire min û rûyê xwe bi destê xwe pêçand. Diduyên dîtir, şûrên bi çirs li destê wan, ban kir min.

- Li ciyê xwe bisekine ... !

«Ewê min bidin ber xenceran», di dilê xwe de got.

- Hun kîne?

- Tu hatîyî girtin, yekê ji wan gote min. Eger tu li ber xwe bidî, emê te bikujîn.

- Ji bona çi?

- Li ser emrê serek.

Diduyê din jî, ji paş, xwe avêt min û destên min badan. Liberxwedan bê feyde bû. Destên min girêdan û ez birim Digorê.

Gava em gihaştin mala Egîd Beg, çireyên wê pêxisû, tavheyveke çilmisî xwe raxistibû li ser gundê raketî. Cendirme derket jor û di hindurê xanî de winda bû.

- Wî bînin hundir! Nemînendeyê Hikûmata Miweqet kire qîr û liber deriyê mezin sekinî'. Li pişt wî, Egîd Beg, dev bi ken li min dinêıi':

- Derbaz be; tuê bibî mêvanê me yê gelek ezîz. Bi keneke tije henek, Egîd Beg gote min, ez dehf dam hundir û den li me girt.

Min çavên xwe li dora xwe gerandin: Çawişê

cendirmê, Nemînendeyê hikûmat û çend Taşnaqên dewlemend, li pişt masê rûnişûbûn. Egîd Beg ez kişandim ber wan û got:

- Haji we re!

- Tu bolşevîk î? Nemînende ji min pirsî.

182

Min deng nekir.

- Bêje! Ev tu î ku gundiyên kurd radike ser me? Xeber bide!

- Li xwe nagire bi me re biaxêve jî, Egîd Beg bi henek got, çavên wî ji xezebê agir dibarand. Bi gavên hêdî tl giran hate ber min:

- Biştexi1e! ew ziriya û kulmên xwe givaştin.

Min devê xwe venekir.

Hingê wek kitikekî xwe tewand tl xwe avête min. Bi her du destên xwe qirika min girt û ew givaşt Bihna min çikîya û ez ketim erdê.

- Ah! Ah! Sa! Kurê sa! Tu erd dixwazî?! Egîd Beg digote min tl bi gîzmeyên xwe pê li laşê min dikir. Piştre ji cendirmeyan re got: «Wî bibin axurê tlwî hepis bikin; ezê bikim ku xeber bide»

Ez kişandim hewşê û avêtim axurê. Cendirman û çawişên wan ez diêşandim û miameleyên xirab bi min dikirin. Zibi1 bi min didan kişandin, li rOyê min tif dikirin tl li min didan; lê wa dixuya ku nediwêrîn min bikujin. Egîd Beg bi xwe, herwekî piştre min bihîst, nedizanî çi bi min bike; mÛla ku li benda tiştekî bû ...

Êvara roja pêncan, ez birim daîreya hiktlmatê tl kaxitek bi min dan îmza kirin. Tê de min sond dixwar ku êdî di wê minteqê de tu tev danê nekim. Piştî vî, serbest berdam. Gava ez derketim derve, çOna xwe ya rast bi rast mal, min baş nedî, tirsiyam ku Egîd Beg min bêxe xefkê tl li nav çiyan tifingekê li min bide berdan. Çend rojan, ez li cem gundiyekî ji nasên xwe mam, û bi wî min ji Morove re da zanîn ku bi şev bi çek bê û min bibe.

184

Morove dereng nema, Q bi şev çend Kurdên çekkiri re, hate Digorê. Di nav wan de min rOyê cidî û xemgîn ê Cindiyê Ûso dît.

Li rê min her tişt gote wan.

Morove bihnteng dibû a dixwest pereyê Egîd Beg jê re vegerîne. Ango, dixwest vegere Digorê û wî bikuje. Min xiste eqlê wî ku armanca me, ne xwîn rijandin, lê şiyarkirina Kurdan Q xilaskirina wan ji bin nîrê beg, axa, Taşnaq, xwedîmilkan ba.

Tuê limala min bimûıî, Cindî gote min. Ew nayên cem min ...

U min xwe li mala wî veşart.

Çend roj borîn. Êvarê, bi dizî, ez ji cem Cindiyê Ûso derdiketim û bi Morove, li gundan digeriyam; min ji gundiyan re, Bolşevik çi bûn dida zanı"na digote wan ku divê erdên dewlemendan ji wan bên standin û ji gundiyan re bêne parkirin.

A

Êvarekê, gava em li mala Cindî civiyaban a me behsa tirs û sistiya Kurdan dikir, jina Cindî ji nişkave kete hundir û kire qîr: «cendirme! ... »

- Li ku ne? Me qîrand a raban ser xwe.

- Li mala kalo Şemo

- Xwe veşêre! Cindî gote min aji mal derket. Min xwe xist nav kahê.

Gava cendirmeyên siwarî hatin ber deriyê me, banî bavê min kirin a bi qirbac ew tirsandin:

- Bêje! Kurê te li ku ye?

186

Bavê min digiıi fi sond dixwar ku ji roja Digorê, ez nedibfuıı. Diya min, di nav ax a tozê de, li ber hespan, li ser çogên xwe, digiıi fi hêvî ji wan dikir ku rehma xwe li wan bînin ...

Xelk li hev gihabfin. Cendinnan li her derê malê geriyan, gava ez nedim,ji kîna xwe, dîsa bela xwe dan dê fi bavê min. Lê, gundiyan xwe xist nav wan û ew ji destê wan xilas kirin û gotin wan ku ji roja Digorê, êdî tu kesî ez nedibûm. Cendinne, destvala vegeriyan û gotin dê a bavê min ku eger ewê min bigirin, ewê hesabê xwe bi min re bibînin ...

Ev tişt giş, Cindî piştî vegera xwe mal, gotin min; ji bo dê û bavê min ên pîr a kal, dilê min dişewitî, lê min dizanî ku heya ez li wê me, hikûmat û begên me ew rahet nedihiştin. Min fikra xwe gote Cindî. Ew hinek

ponijî û piştre fikra min qebûl kir û qerar da ku piştî çend rojanezji wêderê herim. JinaCindîtarikêmintije kir. Min ji wan îzin stand û çûm ji dê û bavê xwe xatirê xwe bixwazim.

Di mala me de her tişt tevlihev bûba. Diya min li erdê, bi giıin, hûnnirên me yên belawelabayî, li hev didan. Bavê min raba, hate ber min, midetekê li min nêıi :

- Ereb, bêje te çi diziye? Gote min a destê xwe danî ser milê min.

- Min tu tişt nediziye, bavo.

- Nexwe, te kuştinek kiriye?

- Min tu kes nekuştiye.

- Nexwe, cendinne, çima li te digerin?

- Ez nizanim.

188

- Tu naxwazî rastiyê bêjî bavê xwe, diya xwe?

- Bavo!

- Bêje ...

- Ez dixwazim ku gundî xwedî erd bibin, bextiyar bibin. Û tu jî bibî xwedî erd. Te seh kir, bavo, çima bi dOmin dikevin, li kuştina min digerin? Nihu ez diçim, lê, ezê dîsa vegerim. Bi xatirê we! ...

- Ereb tu kurê me yê tenê yî, em êdî pîr bOne, çima tu li hel aka me digerî?

Bavo digirt, 0 hêstirên mezin di çavên wî re dihatin xwar 0 di ser royê wî yê qemıiçî re diherikîn.

- Em şivan in, em ne mihtacê erdê ne, diya min digo, li ser çoga xwe dikişkişand 0 bi tiliyên xwe yên hişk çîpên min digirtin.

- Bi xatirê te bavo!...Min ew xurt di hembêza xwe de givaşt, 0 piştre, min diya xwe ji erdê rakir.

- Ereb! Bi nalînê, ewê gote min, 0 bê hereket, kete ser koşmayê.

Min tarikê xwe avête milê xwe 0 bi lez, min da rê. Li dOr, di nav tehtan re, şin"ta şefeqê bi wr dixuya. Min berê xwe da Aleksandropol (îro Lenînakan).

190

3- Ji Aleksandropol ta Stavropolê

Li Aleksandropol esker pêl didan. Li meydanê, li stasyonê, kom kom diçûn û dihatin.

Hin tirêna «mêrxasên Sen Corc» dibirin eniyê. Ew bi qîrîn û xeberan dihatin verêkirin, û hema bi hev re pev diçûn. Tirênên ku ji enî dihatin tijî gOşiyên eskerên çekdar ban. Ewên ji cebhê hatî, li stasyon bi deng û tevdanên xwe, qiyamet radikir, mîtanga pêk tanîn, şandiyar rêdikirin yekîneyên din ku diçan eniyê, siwarî tirêna dibûn bi gotinên «Mal ... » bi rê diketin û di tariyê de winda dibûn.

«Herin enî êdî qe ... » Vasiya, eskerê bo1şevîk ku min di hatina xwe de li Aleksendropol naskiribû bi kêfxweşî, di nav diranên xwe re fikand.

Xwe avête tirêna ku dikete stasyonê, xwe pê girt û gote min:

- Şamil we re, xwe bavêjiyê!

-Di mezeloka tirenê de min ciyê xwe çêkir.

192

Ber bi Tiflîsê ve em bi rê ketin.

Çend rojan, li Tiflîs, me nedizanî em çi bikin? Dihate gotin ku li rê, tirên disekinandin., xelk talan dikirin, çek distandin û dikuştin Rewş endîşenak bû. Digotin ku linêzîkî Gencê, tirênek perçe perçe kiribûn, heçî tê de bûn çekê wan hatibû standin, Û tu kes nedizanî ew biribûn ku ? Mudirê stasyonê nedihişt ku esker bi rê kevin. Ji nişkave, hate gotin ku ji bo bêçek û rêkirina eniyê eskerên ku li Tiflîs bûn, Kozak bi-aniyana ... Esker xwe tev dan. Mîtîngek danîn, da ku bizanin li gora vê xeberê, ewê çi bikin? Çekên xwe bidin wan an xwe li ber wan bigirin? .. Vasiya diçû û dihat û bi çend eskeran re pistepist dikir.

- Şamil! Ewî dawiyê banî min kir.

Ez nêzîkî wî bûm.

- Gelo tu riya Viladîkokaz dinasî?

Gî li dora min kom bûbûn.

- Belê, ez dizanim. Min vegerandê. Tevî vê yekê tu cara bi peyatî, ez neçûbûm Viladîkokaz.

Me da rê. Panzde rojan em liçiyaman,dawiyê,di meha çiriya pêşîn de em gihaştin Viladikokaz.

Li vir bi xwe, tu nîzam tunebû. Esker, bi timamî, tirên zeft dikirin û diçûn Rûsya. Hevalên min xistin serê min ku ez jî bi wan re herim Stavropol. Li

Viladîkokaz jî, Hikûmata Miweqet hebû û min li wê tu kes nas nedikir. Min dilê xwe kir ku ez herim ciyên dûrtir, Rûsya, xebatgeha Bolşevîkan ...

Bi vî awayî, em gihan Stavropol.

Roja dîtir, ez çûm li hevalên xwe yên partiyê bigerim. Rojeke timam, min her derê bajêr nas kir, bêî ku rastî tu nasê xwe bêm.

194

Ez vegeriyam stasyonê. Li nav bajêr, bêdengî hikimfenna bû. Bi Vasiya re dûr û dirêj li ser rewşa xwe, me axaft. Di dawiyê de, me qerar da ku em hinekî bisekinin. Da ku em ji nêza nemirin, me ji xwe re hema1tî dikir.

Ûsa, me çend roj derbas kirin.

Carekê, listasyonê ez li şixul digeriyam. Rêwiyek li wê rûniştîbû û li ber lingên wî jî çend çente hebûn ; min xwe nêzîkî wî kir:

- Hemwelat, belkî tu hewcedarê arîkariyê yî? min gotê û çenteyên wî nîşan danê. Ewî, ji ser serê min heya lingên min li min nêrî:

- Gelek baş e, arîkariya min bike, ezê heqê te bidim, ewî li min vegerand.

Min çente danîn milê xwe û em çûn mala wî ku ji stasyonê gelek dûr bû.

çente pir giran bûn û yek ji wan di pişta min re hate xwar. Tirsiyayî ez sekinîm. Ewî şennezar li min nêrî :

- Min efû bike heval! Ez ji sîngê xwe brîndar im; ji lewre min nedikarî aıîkariya te bikim.

Ji min re «heval» got., ez fikirîm û min çente dîsa hilgirtin û em di riya xwe re çûn.

Gava em gihaştin mala wî, ewî heqê min a çaya kolbasa dan min a ji ku dihatim ji min pirsî. Min baweriya xwe pê anî û çîroka rev a hatina xwe jê re go.

- Nexwe tu bolşevfk î? ewî ji min pirsî, bi ken.

- Belê ...

196

- Kaxitên te hene?

- Çi kaxit?

- Şehadetname yan pirseke borînê.

-Na ...

- Ûsa nabe ... Lê, binêr min, ezê ji te re tiştekf binivîsim; here vê adresa ha, ewê te qebûl bikin ...

Min karta wî girt û bi dilşahî ez çûm ku li Vasiya bigerim.

Roja dîtir em ketin Ordiya Sor. Fermandarê me Mîralay Şpak bû ...

198

4- Şerê Hundir

Di sala 1918 de, mifreza me di mintiqeya Salîsk de, Şerê çeteyên Rûsên Spî dikir.

Gava mifreza me girêdayî alaya yekemîn a Stavropolê kirin, hevalê min Vasiya, Çûgûnov di

vegirtina Batayisk de, hate kuştin. Piştre, di mintiqeya Tsaıitsfn de, me bi Rûsên Spî re lihevxistin; û di dawiyê de, em çûn ku Stavropol Ji çembera Kozakan xilas bikin.

Her wekî, ji leşgergeha wî, ji eniyên din re qiwet rêdikirin, rewşa Stavropol roj bi roj, dijwartir dibû. Çeteyên Spî li dora bajêr xuya kir, û Ordiyên Spî xwe kar kir ku êrîşî bajêr bikin. General Şkûro, eniya me qelaşd û hate me. Piştî şerên xwînrêj, bajar kete destê dijmin. Me xwe kişande gundê Tatarskoye û ji wê jî, bi 200

berêrişekê, me xwest ku em bajêr disa bêxin destê xwe. Du caran, em gihaştin nav bajêr, lê her du caran ji em bi şûnda vegerandin. Di van lihevxistinan de, yek ji fermandarên me yên mêrtir 0 hêjatir, heval Şpak hate kuştin. Ji gundê Tatarskoyê, me xwe kişande ser Nevimoskaya. Di van şeran de, ez ji bo caran sisiya brindar bam, lê min xwe ji sefan dOr nexist. Ji bo êrişa Stavropol, liber çemê Maniç, bergeheke nAhate danin. Bi mifrezeyên piçûk, me avêt ser bajêr, lê, li Medvêdka em bi şOnda hatin êxistin. Li wê, nexweşiya tifOs ez avêtim erdê. Bi birindaran re ez birim Piyaûgrosk 0 ji wê Viladikokaz.

Li wê ji, bi nexweşiya paratifoid, ez disa ketim nav nivina. Ez hêdi hêdi hatim ser xwe. TIfOs, û paratifoîd, ez yekcar ji qewet xistibûm 0 xwarina xestexanê jî nedihate xwarin. Hingê, Çeteyên ROsên

Spî, dest bi êrişê kir. Rojekê, me dengê topa bihîst. Xestexane, wek kumîroyekê fOri, kelekel ba.

- ROsên Spî. .. ROsên Spî. . . Ev pirs li dora me, ji devê her kesi derdiketin. Ên ku dikarin ji piya bisekinin, lez didan xwe ku ji xestexanê derkevin.

o

Li cem min Kozakekji KAban hebA; raba ser xwe cilê xwe xwest.

- Tu diçî? Min jê pirsî.
- Herê.
- Ku da?
- {(webigehînin ordiya xwe.
- Lê, ka binêr! Tu bi zor xwe li ser pi ya digiri ...
- Xem nake, li derve, ezê xurt bibim. Ma tu

202

dixwazî ez livir bimûıim da ku Stanişkirî (hêzên Rûsên Spî) bên û min bidin ber şûran ?

Kozakê me ji xestexanê derket Min dil kir ku ez herim, lê, ez ewqas sist bûm ku bê arîkariya tu kesî, min nedikarî li odeya xestexanê bixwe bimeşim.

«Çiqas ji min bê, ezê xwe zû rahet bikim!»

Ev xwestin di min de ewqas xurt bû ku, yek dikare bêje, ewê di çend rojan de ez bi qewet kirim. Di nav odê de ez êdî, bi tena xwe dimeşiyam, nêzîkî pencereya dibt1m û guhê xwe dida dengê tifing an.

Şer êdî, li nav bajêr çêdibû. Rojekê, serê sibê me bihîst ku Rt1sên Spî ketine nav bajêr t1ew girtine. Piştî

çend saetan, Kozak hatin xe~texanê ; ew di nav nexweş t1 brîndaran de li Kozakên komunîst ên navçeya xwe digeriyan; gavaji wan didûin ew di cî de dibirin hewşê t1ew didan ber qundaxên tifingan û piştre dikuştin.

Serê minê rût t1riha min a li xestexanê dirêjbûyî, şik xiste dilê wan ku ez cuhî me.

- Tu cuhî yî! Digotin min, her du milên min digirtin û ez dihejandim.

- Na, ez Tirk ... Kurd im.

- Tu derewa dikî û ev? ... Berde! ... Binêrin ... Bi zor derpiyê min daxistin. Min digote wan ku ez misilman im û ku... Şewata derbekê qûndaxa tifingê, gotinên min dan birîn. Ez avêtim erdê û bi kulman bi min ketin. Di vê gavê de, Sertebîb xwe gihande hewara min.

204

Li ser milên wî nîşanên zabitan heb6n :

- Ev çi ye? Çi dikin? Ewî qîr kire Kozakan.

- Ez benî, em hêsabê cuhîyekî dibînin ...

- Kê gote we ku ev cuhî ye? ..

- Cuhîbi xwe ye. Ez benÎ... Li vir, temaşe bike!

- Ev Kurd e, misilman e...Wî di cî de berdin!

.

.

Kozakan, şaşbûyî, ez berdam; lê ne bi dilê wan bû. Gava derdiketin qîr kirin min:

- Emê dîsa bêne te, tu ji destê me nafilitî ...

Wê şevê, ji derban ketî, mest 0 helak, min ji nexweşnêr hêvî kir ku ji min re cilekî peyda bike. Ên hevalên me yên mirî, giş li wê bOn. Pîrê ji min re pantalonek qetiyayî û çakêtek anin. Ber bi sibê ve, min xestexane berda, 0 li derve, rastî Ermeniyên mihacir hatim ku bi min gelek şa bûn. Yek ji wan, Xaço, nasekî me yê kevn bû.

Li bajêr, talan 0 vegirtina xaniyan bê perwa dom dikir. Xwe veşartin dijwar û bi xeter bO. Xwediyên xaniyan ji bo nefsa xwe dilerizîn. Tu kes nedikarî gazinan ji wan bike, ji ber ku li kuçan, li ber deriyan, komunîst, eskerên Ordiya Sor 0 herçî kesên ku ew vedişartin didan ber tifingan an bidarve dikirin. Li nav bajêr ger bi xwe, bi xeter bA; eger hema kêfa Kozakekî serxweş an zabitek bi rûyî yekî nehata, di cî de, te dikişandin xwendegeha eskerî ya "navdar" 0 kes ji wê sax dernediket

Dawiyê, jina Xaço, derketina min ji mal mina-sibtir dî. Êvarekê Xaço ji min re nan û kartol dan 0 ez bi rê ketim. Bi şevê, ez ji bajêr derketim; armanca min ew bO ku di eniya Rûsên Spî re derbaz bim 0 xwe bi gehînim bajarê Astraxanê.

206

Piştî çend rojan ez gihaştim gundê Qîz1er. Min ne pere ne jî nan hebO.

Enneniyekî dewlemend ez birim cem xwe ku ez jê re bexçevaniyê bikim.

Hema, li delVa razan, xwarineke ne xirab tesîra xwe nîşan dan. Min dest pê kir bi lez werim ser xwe. Digotin ku di van rojan de, Soran, di nav zilan de xwe dabûn xuya kirin. Bi kêfxweşî min guh dida van xeberan û ji bin de jî min xwe pêk tanî ku ez dom bi riya xwe bikim. Piştî çend rojan, firseteke xweş kete destê min.

Carekê, çend zabitên serxweş hatibOn bexçeyê me. Efendiyê min ji wan tirsiyayî, ji wan re xwarin, vexwarin, jin anûı û sefahet dest pê kir. Wê şevê heta sibê, heya ji serxweşî bêhiş ketin, vexwarin. Hinek ji wan, mestbûyî, li bexçe, li bin stêran raketin.

Wê şevê, xew qet neket çavên min û min seyra sefaheta wan a kirêt kir. Gava giş serxweş ketin min xistê eqlê xwe ku ez çekên wan bidizim û xwe bavêjim nav zilan. Du tifingên Kozakan, li ber masê avêtî bûn, lê, rext li raketiyan bûn. Min bêhna xwe girt û çar lepika, xwe gihande Kozakekî, rextê wî birî, tifing girt û ji wê reviyam. Mideteke dirêj, bêî ku rastî hevalên xwe yên Sor bêm, ez di nav zilan de geriyam. Ji teab ketî, min xwe dirêj kir ku hinekî bêhna xwe bistînin. Hindik mabû ku ez di xew herim, çend zilaman xwe avêtin m~n û di nav milên xwe de ez givaştim. Min mr da xwe ku ji destê wan bifilitim, lê ez xurt girtibûm û li berikên min digeriyan. Min baş li rûyê wan nêrî û ji

208

nişkave, kenekê ez girtim. Nexwe, ew bfuı ... Fedaiyên

me yên sor bi xwe bfuı.

Gava zanîn ez kî me, ez birim mifrezeya canbêzaran. Li çiyan, li dar û deviyan me xwe diveşart û me davêt sertirênên çek û posatşerû yekûıeyên piçûk ên Rûsên Spî. Me riya eskerên General Dratsenko ên şikestî digirt û gelek xisar didan ordiya Şkûro ya tarûmar bûyî. Di van rojan de, Ordiya Sor jî, eskerên General Denîldn, ji Xarkof derdikirin.

Di bihara sala 1920 de, li Georgîviyesk, me xwe gihande Ordiya Sor.

Li Qefqasyaya Bakur, dijminên Şoreşa Sor şikestibûn û hemû eniyên şer ji wan pak bûbûn. Em, şerevan bi xwe, çfuı eniyeke nû, eniya ava û sazkirina aboriya (iqtisadiya) wêran a Qefqasya ya sovyetî.
210

5- Veger

Salên Şerê Hindur, ji bo mideteke dirêj,ji Kurdistan,ji welatê min ez bi dûr xistibûm. Di sibata sala 1924 de, partiya me ez rêkirim Ermenistanê da ku li wê, di nav Kurdan de bixebitim. Komîteya Navendî (Licne Merkezî) ya Partiya Komunîsta Ermenistanê, ez hînkerê komîteya navendî û endamê şûba «Eqeliyatên qewmî» tayin kirin. Ji wê rojê de, rOpela ji yina min a nû dest pê kir. Min xwe xist dijminên sedsalan : şerê axa, Taşnaq û began, da ku li şûna wan, li warên koçer û li gundên sovyetan pêk bînin.

Bi dilxweşiyeke mezin, min çiya il çêreyên

welatê xwe dîtin, ciyên ku di piçûkahiya xwe de, min bi bav û brayên xwe re keriyên xelkê çêrandibûn.

Mij hin bi hin stûrtir û bi xoftirdibû û serê Axxi yê bi ewir, ji min vedişart. «Dê il bavên min, hin sax in gelo?». Di dilê xwe de minji xwe dipirsî û sibê zû hêdî hêdî, nêzîkî çiyayên gundê xwe yên kesk dibûm.

212

Va ne holikên me, yên di erdê de temiri! Lê çi qewimiye? Gundên Kurdan giş vala ban. Deri û pencereyên xaniyan vekiri ban...Çi Bi gundiyan hatibû? Morove li ku ye ?.. Bavo, yadê ?.. Ez daketim newalê. Di çemê şile re ku sînorên gundên ermenî û kurd pêk tîne, derbas bûm û liber xaniyê pêşîn sekinîm. Ermeniyekî porspî, di bîstanekî de erd dikola.

- Heval! Min gotê, Kurd li ku ne?

Ewî çavên xwe yên nîv-kor rakirin ser min, bi milê xwe xweydana xwe paqij kir:

- Gelo tu nizanî? Ewî bi bê baweri, vegerande min û dîsa ziviri şixulê xwe.

- Guh bide min, min gotê û ji hesp hatim xwar. Bêje min, diya min, bavê min Şemo, li ku ne?

- Şemo? Ma tu nû hatiyî?

- Belê.

- Ew giş çûne ... Kalo destê xwe dirêjî çiyan kir.

- Ku da?

- Ser çiyayê Alagozê.

- Alagozê? Ji mêj ve?

- Belê, ji mêj ve. Here li wan deran bigere ...

Piştre, kalo, pişta xwe, bi awakî welê da min, min fehim kir ku êdî tu gotinên wî nemabûn.

Piştî ji mal derketina min bi çend rojan, hikim ketibû destê partiya Taşnaq. Ev partiya Ermeniyên dewlemend, a dijminên sewrê, bû. Armanca wê ev bû: pêkanîna Ermenistanekî ji deryakê heya derya din ango ji Derya Reş heya Derya Spî. Ji bo bicîhanîna vê

214

annancê, ewê qelandina Kurd 6 Tirkên Ennenistanê danibû ber xwe, da ku timamî paşiya xwe ji wan pak bike û piştre bi hemû qewetên xwe, xwe bavêje ser Tirkiyê.

Ji lewre, nihu min gund vala didîtin û ezab û şkence yên xebatker 6 feqîrên kurd, dihatin ber çavên min. Kurdên ku min li bakurê Qefqasyê, dîbûn, ji min re qala zilma Taşnaqan kiribûn. Çeteyên Taşnaq, bi çekên ku Ordiya Çar li Ennenistanê hişti ban, gundên kurd 6 tirkmen, talan û wêran dikirin.

Lê, eşîrên ku, wek Sipki, Hesenî û Zurkî, serekên wan hikmê partiya Taşnaq qebûl kiribûn, li ciyê xwe mabûn. Mezinên wan ritbe û nîşan standibt1n. Hinek ji wan bûb6n efser (zabit). Van axa 6 began, ji Taşnaqan re eskerên kurd pêk anîbûn û pê, bi hevaltiya Taşnaqan, feqîr 6 xebatker diqelandin. Li ser her mifrezekê kurd, Taşnaqan yek ji zilamên xwe yên mixlis datanîn. Li miqabilê vê arîkariyê, begên kurd ji nûve, sixreyên

derebegitiyê danîbt1n, heta ewên ku di zemanê Çar de bi xwe hatibûn rakirin jî. Xebatker, êdî ji taqet diketin. Taşnaq, mawzer di dest de di bin emrên ximpabêt (serekên çete) ên xwe, li gora dilê xwe, dikuştin, talan dikirin, dişewitandip, xelk didan ber şt1ran. Tu kesî ne-dikan serê xwe li ber hovîtiya wan rake. Serekê eşîra Zerki, Cangîr axa, bûbû serfennandarê quwetên kurdî yên «dilxwaz» Û ritbeya serheng (mîrelay) standibû. Yusif Beg Teymûrof jî, di par1ementa Taşnaqan de nemînende ba.

Beg har bûbûn. Kê bi emrê wan nedikir, heya bikeve ber mirinê, dihate lêxistin; milk û pez û dewarê

216

wî jê dihatin standin. Ji bo Ordiya Tasnaq, bêşên bilind hatibı1n avêtin ser xelkê, dewar il zadên wan, bê hisab û kitêb, dihatin zeft kirin. U, para şêr, dîsa di destê began de dima. Egîd Beg Teymilrof ji aliyê Taşnaqan serekê eşîra Şerqî tayin bûbû. Herwekî, Şerqiyan êdî nedikarîn hikmê Taşnaqan hilgirin; li deşta Serdar-Abad isyan kiribûn û danîna hikmê Sovyetan xwestibı1n. Ji bo şerê wan, Taşnaqan li bin ferman-dariya Garo Sasonî, ordiya xwe rêkiribûn. Eşîra Şerqî ya piçilk, bê çek û bê arîkarî nedikarî li ber alayên Taşnaq ên heya diranên xwe çekkirî, xwe pir bigire. Isyana wan neçû serî û rebena ji destê Taşnaqan, şkence yên li tu deran nedidîtî kişandin; her tiştê wan hate hilweşandin û ew bi xwe di xwîna xwe de hatin

xeriqandin ...

Çend rojan, bi hêviya peydakirina dê û bavê xwe, ez gund bi gund geriyam, lê, tu kesî nedikarî min li ser wan ageh bike. Herwekî Kurd girêdayî adetên xwe bı1n, gava min behsa wan dikir, serê xwe xwar dikirin il bê deng diman.

Hingê, min zanî ku felaketek hatiye serê dê û bavê min. Min berê xwe da Alagozê, cem Kurdên koçer. Di niqtek polîs de min bi xwe re cendirmeyek bir û êvara roja dîtir, hêdî hêdî, di şiverêyeke teng re, em gihaştin çiyê. Hespên me di kaşa çiyê re bihn çikandî bi rê ve diçiln.

Bîsteke dî em ketin merceke piçûk. Li vê, li wê, ber bi geliyê ve, konên reş hatibûn danîn. Li ber konekî, Kurd kom bûbûn; em li cem wan sekinîn il ji wan hêvî

218

kir ku konê serekê sovyeta koçeran şanî me bidin. Giş bê deng lihev nêrîn -0 destê xwe dirêjî deştê kirin :

- Sovyet li wê ne, cem me, li vir, hin beg -0 şêx in.
- Ev çêre, ya kîjan eşîrê ye? Min pirsî.
- Ya eşîra Hesenî ye.
- Serek kî ye?
- Elixan Beg Teymûrof, yekî ji wan got. Ûserekê çêre jî, Şêx Silêyman e. Tu bê feyde pirsa sovyetan dikî.

Piştre konekî mezin (}zengîn şanî min da -0 bi ser de ajot:

- Mistefa Beg Teymûrof hatiye; ew hez nake ku Kurd behsa sovyetan bikin.

Zilamekî bejin kin, ji kon derket û ber bi me ve hat. Ji kemera wî ya zîv xencerek daleqandîbû. Di destê wî de, qemçiyeke bi qebda zîv în hebû. Kurdan, liber wî xwe heya erdê tewandin.

- Çi dixwazin? Bi TÛsî,ewî ji me pirsî.

- îşê me bi serekê sovyetê re heye, bi nermî, min vegerandê.

Mistefa Beg kenî.

- Êl-begî pismamê min e, û mala wî ha li wê ye! Ewî gote me û bi destê xwe newalek, di mija êvarê de nıv-xuya, şanî me da.

- Spas, min gotê û hespê xwe ji nû ve ajot.

Li ber devê newal, bi tenê bi kevir dora wan girtî, konên Kurdên feqîr hebûn. Li ber deriyê yekî ji wan, jinikeke bejin bilind û porspî, disekinî. Min silav lê kir, TÛ-0 dengê wê tiştek ji zarotiya min a dûrketî anî bîra min.

220

Min bala xwe dayê.

- Xaltîka Parê! Min qir kirê t1ji hesp hatim xwar. Ew, tirsiyayî xwe bi şt1n de da.

- Ez Ereb im, Ereb Şemo. Ez nayim bîra te, Xaltîka Parê?

- Na, tu ne Ereb i, tu bê simbêl i, te rOyê xwe kur kiriye! Ewê bi hişkî gote min.

- Kurkirî ?

Hingê hate bîra min ku li cem Kurdan, kurkirina simbêl guneheke mezin bO !

Min gelek xwe westand da ku baweriya wê bînim ku ez Ereb Şemoyê şivan bi xwe bûm, ku pir caran, ewê ez ji destê bavê min derêxistibûm, gava ewî dikir ku li min xe. Ser van gotinan, êdî tu şikên wê nemabûn t1bi kenekê dilxweşiyê ez ezimandim mala xwe. Em ketin konê wê yê disa weke berê perîşan. Di ci de, Xaltîka Parê, xwe da xebatê da ku ji me re xwarinekê pêk bîne.

:..Ereb, çi hatiye serê te? Mûyên spî ketine porê te ... U destê xwe li ser serê min gerand.

Min hingê behsa Rûsyaya Sovyetî t1 şerê hundir kir, ûji vîbişûnda, Kurd êdî çawa wê bijîn, gotê. Bi şev dereng, Gelo, mêrê Xaltika Parê, hate mal. Ewî,ji sibê heya wê demê, şixulê begê xwe dikir. Gava bihîst ku ez kurê Şemo me, bi kêfxweşî silav li min kir û rOnişt. Dt1r t1dirêj li ser jiyana Kurdan me ji xwe re axaft.

Çar şal bûn ku nîzama sovyetî, li Ermenistanê hatiba danîn, lê, gundî û koçerên kurd, dîsa wek berê bi ist1laeşîrtî dijîn, liserwan, dîsa axa an kurên wan bikim

222

dikir. Hîn, meclisên eşraf û dewlemendan hebûn, û şêx jî ji aliyê xwe gundî û rencberên kurd bi navê dîn tazî dikirin.

Isûlên istismara Kurdan weke berê diman, bi tenê rengê wan guhinbûn : nihu, axa û beg şûna ku rast bi

rast bi destê xwe, xelkê biêşînin û malê wan bixwin, şêx didan pêşiya xwe. Perçeyên erd, çêre û zozanên baştir, di destên beg û gundiyên dewlemend de bûn. Ûyên ku bi kên tu tiştî nedihatin, ji gundiyên feqîr, rencber, belengazan û hin piyan re hatibûn hiştin. Keriyên began, bi hezaran ve sen ji bêşan miaf bûn, ji ber ku xwediyên wan li ser hikim bûn. «Edalet» jî bi awayê berê dîsa bi destên began dihate bi cîh anîn. Di nav eşîrê de,ji bo neheqî û mixalefetekê, axan û bega pez an pere distandin, bê şik ku ji bo xwe, lê ne ji bo yên ziyandîtî. Xelk hîn xûkî didan beg û axan; lê Dihujê re recO ango diyan digotin !Zilamên began ên xas hebûn, ku xweş têrkin, li her derê, pesnê begên xwe didan û ew parazkerên Kurdan didan zanîn. Gava nemînendekî sovyetî dihate wê derê, ev xulam diçûn pêşiya wî û li singê xwe dixistin û qîr dikirin ku di nav eşîrê de bikim gelek baş eûfeqîrjihertadaû neheqiyê hatine parastin. Kurd ciyên qemçiyên began xweş tanîn bîra xwe lê nediwênn rastiyê bibêjin nemînendeyên sovyetan. Ji çîrokên Gelo, yekî xweş his dikir ku ev Kurdên peıişan liriyekê digeriyan ku ji vê rewşa dijî qanûn xelas bibin. Gava Gelo bihîst ku ez ji Erîvanê hatibûm rêkirin da ku Kurdên feqîr bigehînim hev, erd û çêre ji destên began il axa bistînim û wan ji yên mihtac re par bikim, bi tirs gote min:

224

- Ereb, beg, axa 0 dewlemend xurt in, lê, em bi

xwe ? .. Û Gelo çavên xwe likonê xwe yê nît gerandin.

- Divê arîkariya Hikmê Sovyetî bikin, da ku xelk ji zilma axa, beg 0 dewlemenda xilas bikin? Divê ku hemO Kurd ji xwe re sovyetan deynin, min gotê.

Piştî ku ez bi Gelo re li hev hatim ku êvarê hemO Kurdên rencber 0 feqîr li mala xwe bicivîne, ez sibê zO, ji mal derketim. Nîvro, em gihan çêreya YOsif Beg, serekê eşîra Hesenî. Li wê, li meydaneke piç6k, bîstek siwaıi li hev gihabOn, 0 gundiyên feqîr jî,li dora wan kom bOban.

- Ciiid! Hevalê min gote min.

Siwaran, bi qîıin, serê hespên xwe ber bi newalê ve berdan 0 darên xwe avêtin hev.

Şêx, beg 0 mela, li alîkî,li cem hev bOn Oli lêstikê leyistikê. Gava em ji wan xuya bOn, Elîxan Beg hate pêşiya me; ew ji berê de ageh kiriban. Deh gavan ji me wê de, ji hesp hate xwar 0 bi nîsî xêrhatin da me.

-Li vir serek kî ye? Minjê pirsî 0 li koma beg, şêx o melan nêıi.

- Ez im, xulamê Dewleta Sovyetên Lenîn, serekê koçerên eşîra Hesenî, Elîxan Beg dîsa silav da 0 xwe xwar kir. Em Kurd bi xwe miletekî pi çOk in, em têkilî tu kesî nabin, 0 tu kes kî bela xwe nade me. Miletê me bi xweşî dijî 0 giş jî nizama Lenîn razî ne, Elîxan Beg gote min.

Min dîsa çavên xwe li dora xwe gerandin 0 li ser balgihên nerm paldayî, min kalekî porspî dî. Ew YOsif Beg TeymOrov bO, tevî Taşnaqan reviyabû îranê û di

van nêzan de vegeriyabO. Bi giranî ewî silav da me 0 em ezimandin konê xwe. Elîxan 0 YOsif Beg ne dizanin ku ez Kurd im 0 bi hev re serbest bi kurdî xeber didan. Beg, şêx 0 mela, li dora me li ser çogan rOniştin. Ez gelek kêfxweş bOm ku ez wek biyanî dizanim.

Gava YOsif beg bihîst ku ezji Erîvanê têm, dest bi pesindana Nîzama Sovyetî kir.

Li ser destexanekî xwarin danin ber me.

- Va ye xwarina me, YOsif Beg gote min. «Em miletekî gelek feqîr in. Berê herkesî, Tirkan 0 ROsan li me tade dikirin, lê nihu, li bin hikmê sovyetî, jiyîna me xweştir bOye». Dengê xwe hinekî birî 0 li dora xwe nêrî. Guhdarên wî, giş bi teyid serê xwe hejandin:

- Em bi nizama sovyetî pir kêfxweş in. Em ne Çar ne jî dewleteke kurdî ya biserêxwe dixwazin. Em koçerên serbest in. Heta zimanê me bi xwe nı"n e.

- Zimanê Kurdan nîn e? Min gote YOsifBegO xwe şaş nîşan da.

- Me çi ziman heye? Li vir em bi cOsî0 li minteqa Abaran, Kurdên me bi ennenî dixwînin.

Min dengê xwe nekir.

Êvarê, keriyên pez ên bê hed 0 hesab, li ber konên YOsif Beg bOn kom, «Eve halê te yê qedandinê?» Min di dilê xwe de got 0 liber deh, donzde şivanên bi kincên peritî, li hezaran seriyên pez nêdo

Me îzinji wan xwest 0 me berê xwe da konê Gelo.

Li wê, Kurdên belengaz li benda me bisekiniyana ...
228

Wê şeva ha, di nav tehtan de, li cem konan, civinan Kurdên feqîr yên A1agozê ya pêşin hate danîn. Koçera, bê deng, guh dan gotinên min ên li ser sovyetan.

Min gote wan ku Lenîn dixwest ku miletê kurd azad bibe, di xweşiyê de bijî 0 bi destê axa, beg 0 dewlemendan neyê talan kirin

Pişti civînê, Kurdên feqîr, dîsa bê dengji hev cOda bOn, da ku sibê herin 0 ji gundiyên din re gotinên min belav bikin. Ev civîna me ya pêşîn, bê deng derbaz bO, lê, piştî vegera me, çiya 0 deşt 0 wzan wek lehiyekê xwe hildan :

- Erebê Şivan! Erebê Şemo, Lenin bi xwe ew rêkiriye Kurdan gotin.

Adetên çend sed salan xebatker 0 rencberên kurd elimandibOn sebrê. Ji lewre, ewan bi tirs 0 bi dizî ji halên xwe gazin dikirin. Li cem Kurdên gundî, berê hatina min jî, li hinek ciyan, sovyetên gundan hatiban danîn. Lê, hin dewlemend jî ketibOn nav wan.

Serekê yekê ji van sovyetan, hevalê min, Morove bi xwe bO. Min ev gund, jibo şerê beg, axa 0 şêxan, ji xwe re kire qerargeh. Li wê, bi saz û gihandina xortên kurd me dest pê kir.

Ji bo peydakirina dê 0 bavê xwe ez gihaştim heya Tiflîsê 0 li wê xwişka min, ji çi hatiba serê wan ez ageh

kirim. Piştî çOna min ji mal, Taşnaq, bavê min gelek êşandibûn da ku bikin ku min vegerîne mal. Bavê min,
230

ji bêgaviyê bi kifletênxwe ve,ji welêtdeıxetibû û çûbû mintiqeya Aleksendmpol. Piştî wî, gelek mihacirên gundê me hatibûn wê derê. Lê, li wê jî, kîn û dijmintî xistibûn nav miletan û serekên eskerî' bi kêfa xwe hereket dikirin. Carekê, ximpabêtên Taşnaq, bavê min biribûn derekê û ew êdî venegerandibûn. Piştî çend rojan, nêzîkî gundekî, bavê min kuştî dîbûn. Xwişka minjîbi yadê re derketibû çiyê; liwê diya min jî ji nêza miribû.

Bi vî awayî, min ixtiyarên xwe sax nedîn. Ez vegeriyam serkarên xwe. Di nav salekê de, minji feqîr û rencberan, firqeke xurt pêk anî. Di sala 1925 an de, beg ji hiqûqên siyasî ketibûn liçentsi (berdayî); feqîr ew nedihiştin ku bikevin civînên wan. Şerekî dijwar di nav me û wan dest pê kir. Began xwestin ku xelk li me rakin. Şêx û mela laneta Xwedê limin û lihevalên min barandin û em xayinên dîn, dijminên miletê kurd, dijminên miqedesat û yên adetên bav ûkalan îlan kirin.

Şêx, axa û began miraceatî her tişt kirin, likuştina me bi xwe geriyan, lê me guh ne da wan û liser riya xwe bê tirs û telaş meşiyan.

Di sala 1925 an de, lihemû warên koçeran, sovyet hatin bijartin. Bi vî awayî, me dawiya hikmê beg û axa û şêxên kurd anî.

232

Kurdên Alagoz

1- Tirsa Derebegên Alagoz

Çiyayê Alagoz, çiyakî gelek mezin û asê ye; ji beriya Serdarabad digehe heya geliyê Mîsxan. Bi tenê koçer derdikevin zozanên wî û li wê keriyên xwe diçêrînin.

Pozê wî yê bilindtir, li raserê çar qezayên Ermenistanê yên mezin dinêre : Abaran, Mela Gokça, Talîn û Aştarak. Ji dûr ve, yek dikare li ser dirêjahî û pehnayiyê wî bibîne. Li wê, ewir, wek pêlên derya yên ko di beza xwe de hişk bûbin kom dibin. Ezman jî, liwê serbest û bê hed e. Alagoz di ser deşta Erîvan a dewlemend re hilbûye û rojên genn ên havînê, di rojên paleyî yên dijwar de, çavên xebatkerên ji teab û genniyê ketî, li serê wî yê bi berf dinêrin.

- Gezo, Kurdek ji hevalê xwe re dibêje û bi destê xwe serê pozê Alagoz şanî dide, nihu li wê ba çiqas hênik e, li nêzîkî berfa ku li wê me par şivantî dikir.
236

- Belê, Beko. Eger me bizaniya ku axa ü şêxên melün, em dixapandin,qet me kefiyên wan diçêrandin? Carekê, bifikir! Ez pênc salan, bi kifletên xwe re, Çam ber pezê Egîd ü Mecîd Beg; lê, di dawiyê de bêî ku tiştekî bidin min ez qewirandim. Min li cem

mezinê wan giliyê xwe kir, ewî, di ser de şüna ku heqê min bide, ez dam ber daran, çima min ji began gazin kiribün ...

- Oh, Xwedê, oh Şêx Hadiyê Mezin, te welê kiriye, te ew dewlemend ü em feqîr kirine! ...

Her du jî xwe bê deng dikin ü meıaı, destên wan hîn bêtir qebdên xenceran digivêşin.

Ezman erd ji gelekî nêzîk ve dipêçand, herwekî dixwest wî himbêz bike, roj ewqas xurt diçirisî, wa dixuya ku ewê di germiya xwe de bihele.

Gezo ü Beko, piştî paleyiyê, vedigeriyan malên xwe ü ji pereyên ku kar kiribün, kêfxweş bi rê ve diçfin.

Nêzîkî çiyê bûbûn; bayekî honik ji quntarên Alagoz ew baweşandin. Xiftanên wan vekin, dilşa dimeşiyan ü bêhna kulîlkên çolê ya xweş dikişandin hindurê xwe.

Gava Gezo ü Beko gihaştin gundê xwe, Şemîran, roj çübû ava û pez û dewar digihaştin mal.

Li dora gund, li ser mêrgê, qederê du sed zilam kom bûbûn. Gezo û Beko tirsiyan:

- Ev, her hal, begên me ne kêf dikin, Beko got,

238

eger me bibînin ewê ji me pêşkêşên begîtiyê bixwazin.

Emê li benda şevê bimînin, Gezo vegerand, a emê piştre, ji wê alî bikevin gund.

Her du jî li wê, qederekê, bê deng man, lê piştre da ku bizanin li wê çi derbaz diba, hêdî hêdî, bi dizî, a di

tariyê de, xwe gihandin nêzîkî xelkê.

Qeliya koçeran di dizîkan de sor diba, agıre êzinga pêt didan. Li jor, li ezmên, stêr bi ronahiya xwe ya sar diçirisîn. Li ber êgir, li ser mehfûrên raxistî, doşekên stûr a balgihên nerm beg a axa rûniştibûn. Hempa (dewlemend) li cem wan cî girtibûn. Li paş wan, xulamên wan, heya diranên xwe, bi xencer, şûr, debençe û tifıng çekkiıi, disekinîn. Li vî alîa wî aliyê singê xwe rextan girêdabfin.

Ji wan dûr, gundiyên feqîr, li benda emrên wan, serê wan xwar, li ser hev kom bûban.

Begekji wan raba û bi awirên tûj lidora xwe nêıi:

- Beıi peydabûna vî komunîstê ha, her tişt xweş dimeşiya. Me xwe bi xwe îdare dikir. Xortên me bi gotinên mezinên xwe dikirin, lê, bi hatina wî, her tişt guhiıi.

Şemoyê Oso, mêrxas û egîdê began, ji ciyê xwe rabû û got:

- Ewî ez ji serektiya gund avêtim û got ku ez hempa me (gundiyê dewlemend).

- Zugirtên ku guh didine wî gelek in; ew jî bêbextiya adet a isûlên eşîretiyê dikin û di riya mezin

240

(l kalan re nameşin. Binêrin meselen, kurê şivanê me, berê ji bo perçekî nan li cem Mihê dişixuli, (l nihu ji giliyê wi kiriye daku Mihê kiriya wigiş bidiyê. Evtişt, gişji ku tên? Bê şik,ji vikomunistê; ewê wanhem(lyan

ji rê derêxe, Yûsif Beg bi ser de ajot.

Tu deng nin e. Bişkulên pezdi nav agir de diçirisin, kevirên gennbûyi perçên wek çirûskan dipejikinin. Ba dûmana agir dibe ser gundiyên ku lijêr rûniştine. Bayekî sar tê.

Dîsa bêdengi. Şêxê mezin radibe:

- Hun dizanin çima, Yûsif Beg, Cangir Beg (l Egid Beg, hun li vir civandin? Ewan hun civandin da ku hun, xelkê eşiran, zilamên sadiq (l mêrxas, kêfa xwe binin, dilşa bibin! Hun, xadimên Xwedê! ...

Bi dor ji gundiyan re bi denan mey didin. Xulam bi piyanan ew li civatê belav dikin.

- Bi xweşiya begê min! Şemoyê Oso dike qiıi'n.

Evê ha, li gora talîmatên began, mala feqîr û fıqereyên ku bêemriya wan dikin dişewitine. Ji lewre xelkjê ditirsin. Duhibi xwe, ç(lba talana eşîra Şerqî, ku ji wextê Taşnaqan de rabûbû began. îro ew xiftanek sor û beşmetek zengin li xwe kiriye, piştek çennê zivkiıi' li nava xwe girêdaye. Li bin beşmetê êlekek bestik rast û bi xeml tê ditin.

- Serekê eşira Şerqî dixwaze bi me re bibe, Şemoyê Oso dibêje, lê ev komunîstên zugirt wî nahêlin.

- Xulamên min, eşira min a sadiq! Ûsif Beg dest

242

pê kir. Hun dizanin ku bavê min, bapîrên min 0 kalanên min, mezinahî li we dikir. Em, nihu ji heft bava ye ku

serektiya we dikin. Hunji me re sadiq 0 mOtî bûn 0 hun ji adetên eşîrtiyê dernediketin. Mala YOsif Beg a miqedes 0 nanê wî, hun ji bela, nexweşî 0 peıişaniyê û pez û dewarên we jî ji êşan parastin. Lê, nihu hikmeke nO derketiye, hikmeke ku ne dîn 0 ne Xwedê dinase. Li gora vê nîzamê, divê her kes feqîr, belengaz 0 zugirt bibe, û tu kes jî dewlemend nebe. Hingê feqîr di nav eşîrê de, wê çawa bijîn? Keleş, meselen, 0 hin peıişanên din, eger sê keri yên Xûdo neb\lna, ewê nanê xwe ji ku derêxistina? Na, ev nîzam bi kêıikoçerên wek me nayê. Bi çi awayî ku be, bi aıikariya Xwedê, îro kurê min we îdare dike 0 Cangîr Beg jî li ser eşîra xwe ye. Me, bi vî awayî me xwe xweş îdare dikir 0 tu kes jî di van çar salên îdara me de ji rê dernediket. Lê, va ye, em nizanin ji ku 0 çawa hat? Kurê şivanê me yê kevin, Misto. Ewî bêbextî li dîn, malbat û miletê xwe kir û çû ji xwe re jineke rûs anî, ji dîn derketiye, Xwedê nas nake, bOye komunîst, simbêlê xwe kur kiriye, 0 yek dibê qey şîleatek (gawirek) e. Û ketiye nav şivan û gavanên ehmeq 0 wan dixapîne. Ew jî bêbextî li dînê xwe dikin û dikevin dû wî û xort jî xwe komsomol (xortên komunîst) dinivîsin.

- Ev e mehek e ku ketiye dO min, şivanê Mecîd Beg dibêje.

- Ev gawirê ha, Yûsif Beg dom dike, nihu jî dixebite ku, her wekî gotine min, me bê çek bike. Çi 'aixwaze? Em ji heqê intixabatê dûr xistin û nihu jî çekên me ji me distîne, dixwaze çekên malbata me,

çekên bav 0 kalanên me, ji destên me derine.

- Xadimên min ên sadiq, xelkê eşîra! Bi çi awayî ku be divê em xwe ji Misto xilas bikin. Malê Beg pir e, heya hun bixwazin ewê pez bide we, konekî mezin wê bide we, bi şertê ku hun wî winda bikin.

- Bi navê Xwedê, bi navê dîn û îman, bi pakiya eşîra kurdî, divê hun wî sax nehêlin!

Li ser van gotinan, beg, axa, pisaxa û şêx rabûn û ji zilamên xwe re, dest bi belavkirina diyariyan kirin. Di nav feqîran de, ewê pêşîn ku qebûl nekir tiştekî wan bisn"ne, rencberekji eşîra Zurkî, Edê bû. Di cî de, hemû dewlemend 0 mirovên wan, xwe avêtin wîO kirin ku wî bitirsînin:

- Pîsê heram! Tu bi me re bêbextiyê dikıt

- Êdê xwe ji nav koma dewlemendan derêxist û xwe gihande feqîran ku wek keriyekî xwe digihandin hev ... Tu tehdîd Edê ne ditirsand. Ew ji nihu de, di sovyetekê de bûbû endam û guhdariya gotarên nemînendeyên hikûmatê kiribû û ewî xweş dizanî ku, di nêzîk de, destê prolêtariya wê bigihîşta van çiyan jî û ewê dawiya van tiralan bianiya ...

Hempa, tev dê ji serekên eşîran re sond dixwarin ku ewê heya dawiyê bi wan re bimînin. Lê, feqîran bi xwe xwe dabûn alîkî û bê mad û bê deng, li wan dinêrin. Pîr Ebas xwe nêzîkî wan kir:

- Heft salan, min muxtari' kir û min tu cara Xwedê

ji bîra xwe dernexist; lê, hun wek berxan, ji aliyê vî xwedanenas hatin xapandin! ...
246

- Tu tişt neqewimiye, cemaet vegerandê.

- Belê, nihu ji we re, bi qemçiya xwe, çawişekî cendinne lazim e, yan na diviyabt1 ev wezife bidana min da ku min hun bielimendana îtaeta beg 0 n1spiyên we 0 ne ya Misto. Pir Ebas di nav diranên xwe re ev gotin fîkandin.

- Bira bawer nekin, Mecid Beg, ji aliyê xwe bi dengekî bilind got ku, Bolşevik wê pir dom bikin. Di nêzîkê de, di nêzikê de ewê disa bikevin bin qemçiya me, 0 emê hingê şanî wan bidin ...

Ji şerabê serxweş keû, beg çi dihate ser zimanê wan digotin. Mecid Beg raM, dengekê şerabê di destekî û piyanek ji di destê din de, bi hejandinê xwe gihande feqiran û ku şerabê bide wan. Li gora adetên kevin, herwekî beg bi xwe xizmet dikir, diviyaM ku herkes ji destê wi qedehê bistine 0 vexwe. Hate ber Edê: «Kuro! Di wextê Taşnaqan de ez zabit bûm 0 nihu, kerê mezin, tu li min xwar dinêiî ... Ezê şanî te bidim. Bigir, vexwe! ... Piyanekî tije şerab dibe ber devê Edê.

- Mecid Beg ez venaxwim, ez tayî me.

- Serseriyê mezin! Mecid Beg bi tinaz kire qir, tu nizanî ku şerab ta dikuje? Ewi qedeh dani ser lêvên Edi.

Lê Edê qet venexwar û feqirên din ji jê tam

nekirin. Şêx, axa û rispibi eşkere dijun lê kirin; çimaji destê beg qedeh negirtibû û ji n1yê wi feqirên din ji venexwaribûn.
Goşt, nan 0 şerab, heya sibê, ji maseyan kêm
248

nebûn. Taşnaqek di nav Yûsif a Cangîr Beg de rûniştîbû û wa dixuya ku şîret li wan dikir, ji wan her duyan re pistepist dikir a piştre ewan jî dizivirfn û bi feqîran re diştexiUn. Şîv digihaşt dawiya xwe. Çend hev ji vexwarinê mest bûyî, li ber êgir raxistîbûn erdê a xir xir dikirin. Gelek şêx, hempa û merivên began, li cem hev rûniştîbûn û qala mêranî û talanên ku di wextê Taşnaqan de kiribûn, dikirin.

Merivên Cangîr Bek pesnê xwe didan ku di dema kuştinên qewmî de, tevî wî li gundekî miqdarek jin û mêr civandibûn, ew xistibûn axurekê a bi saxî şewitandibûn. Hinên din li ser çêreyên Alagozê ketibûn hev û digotin ew yên baştirên dinyayê ne !

Hingê Enneniyê Taşnaq (ximpabêtekî kevin) rabû ; xweş bi kurdî dizanî; berê ewî, nivîsarên ku Misto, li ser beg, axa û pisaxa derêxistibûn xwendin û piştre jî gotara jêrîn da :

- Hun baş dizanin, ewî dest pê kir, ev nîzam çawa ye, ew mala gundiyan xira dike û dixwaze ku giş feqîr bin da ku wan hemû bike emele û xebatker. Ji nav we, ên feqîrtir dibijêre û wan dike mezin û serekên we, weke vî Mistoyê ha, mesela. Bi rasti, ev Misto kî ye?

Hun giş baş dizanin ku bavê wî û ew bi xwe, licem Tirk, Molokan, Ennenî û Kurdan, şivan bûn. Tu cara, ji olçekê bêtir zadê wan a ji kerekî pêve tu dewarê wan nebû ku pirtû polên wan bikşîne.

Taşnaq bi destê xwe pîrekî bi simbêl nîşan dide:

"- Va ye axayê wî! Ew dikare rastiyê ji we re bibêje. U nihu jî ev Mistoyê şivan, ketiye nav me û feqîran

250

radike beg, axa û şêxan. Xortan dixapîne, wan rêdike bajêr, û li wê ji dersên ku dabûn Misto didine wan ji. Eger hun hez dikin ku mala we neyête xira kirin, divê ku hun bikevin pey begên xwe û şerê zilamên wek Misto bikin.

Gotara wî, bi reyina seyan û bi dengê simên hespan, hate birin. Dengekî xurt li derve dikire qîrin :

- Serekê sovyeta gund li ku ye ? Ji mi1îsan re (eskerê bejik) cî çêkin!

Cefıl kete nav koma civiyayî. Giş xwe avêtin malan. Taşnaqê bizdiyayî ji şaşbûna xwe, kete nav koma kûçikan ku hindik ma wî bidirinin, eger hinekî dî xwe negihandaba mala Mecîd Beg. Gund xwe bê deng kir ...

252

2- Piçûk di nav xwe de diaxêvin

Gezo û Beko di ciyê xwe de heyirî diman. Ewan xweş dizanîn ku, liwê, lideştê, ligundên Enneniyan ku

ew li havînê lê dişixulîn, siha tu beg nema bû, lê li vir, ligundên Kurdan, wek berê beg hîn bi çek in û hîn kêfa xwe bikim li Kurdan kirin. Gezo û Beko, mideteke dirêj xwe ker kirin û li ser tiştên ku dîbûn, raman. Şeva payizê digihaşt dawiya xwe.
Stêr vedimirîn. Bayekî sar û sivik derbaz dibû.

Gezo ji ciyê xwe rabû, çû cem Beko û çawa zilamekî raketî dihejînin ew hejand :

- Rabe, herin mal, gotê; ew êdî ne li vir in. Emê sibê Edê bibînin û pê re li tiştên ku lazim e bikin, bi fikirin.

254

- Belê, Gezo, gotinên te rast in. Edê kuıikekî hêja ye. Em jî wek li gundên ermenî bikin; emê xwe bigehînin wî, malika xwe (hecre) deynin 0 tevde bixeb-itin.

- Tu çi dibêjî? Te xwe winda kiriye? Malikek ? Tu dîn î? Ew komunîst in lê em bi xwe ne komunîst in.

- Gelo te di civîna xebatkeran de nebihîst çawa Ohanes digot ku gava çend zilam bi hev re xebateke milî dikin, ew xwediyê malikekê tên hesab kirin.

- Belê, rast e, Beko hezîn lê vedigerîne.

- Na, ev ne rast e.

Bi behna bermayiyên dawetê, seyên keriyan xwe nêzîkî kuçikê vemirî kirin. Gava Gezo 0 Beko dîtin xwe avêtin wan. Hingê, her du jî, ji ciyê xwe rab6n, kOçik qewirandin 0 çOn mala xwe.

Wê şeva ha, Edê qet raneket. Gotinên beg, şêx 0 axa, wek derbên çakOçekê di serê wî de diçingiyan. Ji bêrîka xiftanê xwe titOn derêxist, cigareyek pêçand 0 kibrîtek pê xist. Li jin 0 zaroyên xwe yên raketî nêrî; rayên wan, li bin ronahiya kibrîtê çilmisî dixuyan.

Heyva çardeşevî sor 0 mezin, wek firaxekî paxirê qilêkirî, di pencerê lê dinêrî. Edê xiste eqlê xwe ku hema sibê ewê here 0 her tişt ji Mi1îsan re bêje. Gelekî mitalan kir 0 piştre kete xew. Sibê, bi qorîna çêlekê ku jina wî di ber serê wî re dibir garanê, çavên xwe vekirin.

Gava gund şiyar bO, roj qederekê bilind bObO.

Piştî daweta şevê dî, xelk di xew de mab6n; digel vê yekê roj tije xem xuya dikir.

256

Cole (serekê keriya) 0 obebaşi (serekê zozanan) ji bo vegera genniyanan emir dabOn. Herkes dixebitî 0 lez dida xwe: kon radikirin, pa1as, mehfOr 0 kulav ba didan, stOnên kon girêdidan 0 weris 0 xemlan dite-wandin ...

Gezo 0 Beko lez nedidan xwe. Tu tiştê wan nebû. Bi tenê xwediyên keriyan xwe ji bo genniyanan pêk tanin.

Beko li ber mala xwe rûniştibû gava Edê hate cem:

- Rojxweş Beko! Tu kinga hab"?
- Duhî.
- Te li deştê havin çawa derbaz kir? Tu nexweş

neketî?

- Na, Beko vegerandê, ji aliyê nexweşiyê tu gazinên me nebOn, lê em ji gennê fetisibûn.

- Te Misto di? Tu nizani ewê kinga bê?

- Na, çawa me dikari wi bibinin? Em li çolê bûn û qet nediçûn bajêr.

- Çi xeberên nO li cem we hene?

- Gotinên min pir in; lêdibê em xwe giş bicivûıin da ku ez gundi 0 emeleyên enneni çawa xwe tenzim dikin ji we re bêjim.

- Havînê, Beko bi ser de ajot, Misto çûbû zozanan. Li wê xelk dicivandin û ew hini xwe tenzimkirinê dikirin; lê began bela xwe danê û nehiştin ku şixul bibe seri.

- Bêje min, licem we civina duhi ji bo çibû ? Beko jê pirsi.

258

- Ji bo vî tiştî bi xwe, min dixwest ez Misto bibînim, Edê bi dengekî nizim vegerand û li dora xwe nêıi', da ku jê re bêjim ku, li vir beg, şêx û hempa, bi arîkariya Taşnaqan, dixwazin belakî bînin serê wî!

- Belakî bînin serê wî! Çawa?

- Hinekan dixwazin qebîleyên xwe giş bicivînin û licem hikûmatê giliyî wî bikin. Lê, gelek beg û Taşnaq di carekê de kuştina wî çêtir dibînin.

Beko nêzîkî Edê bO û ecêbmayî jê pirsî :

- Lê hevalên me çi dibêjin?

- Hevalên me kî ne?

- Ma feqîr gi ne bi Misto re ne? Ew baş dizanin ku ji roja hatina Misto halê wan xweştir bOye. Carekê bifıkire! Di gundên Ermeniyan de feqîr ji bêşa bi timamî miafin. Lê, licem me, feqîr bêşa koçeriyê, bêşa dexlê û ya bega bid in. Ev çar sal in ku nîzama Bolşevîkan, nîzama şewrên gundî û xebatkaran hatiye danîn, lê li cem me .

... Na bi ya min, nîzama Bolşevîkan hê nehatiye cem me, ew licem yên din e. Beko bi ser de ajot. Hinekî bifıkir, malava! Ez rastiyê dibêjim. Cangîr û Elîxan Beg dîsa bûne serekên eşîrê. Ewê xema kê bixwin? Bê şik xema yên xwe, yên dewlemendan; lê ême bi xwe, me tazî dikin. Nexwe bi rastî, nîzama sovyetî hîn neketiye cem me ...

Hîn dinya zû bO. Hewa ji bêhna erdê ya ziwa dagirtî bû. Roj ku derdiket hinekî bû tali'; ewirekî reşî mêşinî ew pêçand û siha xwe raxist ser çiya, gund, Edê û Beko.

260

Beko weke nalînê, keserek kişand, hinekî wê de çû û li ser kevirekî rOnişt. Edê jî xwe nêzîkî wî kir.

- Bala xwe bide min Edê, Beko hêdîka gotê, di gundên Enneniyan de ku em lê bOn, nahêlin axa û keşe têkilî şixulên gund bibin, heta, wan naxin civînan jî; Xeçedûr axa yê Ixdirê tê bîra te? Milkê wî ji destê wî standin û ew ji rencberan re par kirin. Digel vê yekê, li

cem me hîn beg û axa bi kêfa xwe dikin. Li wê, hema, her roj, minezimê xebatkeran dihat, em dicivandin, bi me re daxafi û emê çawa xwe ji bin destê keşe û dewle-mendan, xilas bikin, digote me ...

- Gava Misto jî me dicivîne, Edê gotê, ew jî me ji her tiştî ageh dike û riyên azadi yê şanî me dide, lê, hin bêbext diçin û gotinên wî digehînin beg û axan. Ma halê me xirab e nihu ? Em êdî tu tişt nadine began û her wekî em feqîr in hikûmet jî bêşanji me nastîne. Lê, eger ji te tê bêşên Yûsif beg û Elî beg mede; ewê di cî de, egîdê xwe Şemoyê Oso rêkin te û bi zor wan ji te bistînin.

- Binêr, ê min, ez çi difikirim? Beko xwe hinekî tevda û got Divê em xeberê bidin Misto, an serekê canbêzaran; yan na, beg wê Misto bidin kuştin.

- Na, vî nakin, Edê vegerand û rabû ser xwe; newêrin xwe bêxin vî belayî. Yûsif Beg bi xwe got: «Divê em wî nekujin, yan na,ji bo wî, ewê me bidin ber tifinga.» Di wextê Taşnaqan de, Yûsif Beg di Civata Miletê denemînende bû,ji lewre bi qanûnan dizane. Di wextê çaran de, her meh diçû cem Hakimê Qefqasya û ji bo serektiya eşîra Kurdên yêzidî yên Qefqasyê jê meaş distand.

262

- Li dawiyê, şevê dî çi qerar dan?

- Piraniya wan gotinên xwe kirin yek ku giliyî Misto bikin.

- Nexwe, divê ku, Beko got, emê banî feqîr û rencberan bikin; herwekî di gundên Enneniyan de dikin û emê, beg û Taşnaq bi Misto re wê çi bikin, bêjine wan. Ez bawer im ku, feqîr û rencber wê heval-tiya beg û dewlemendan nekin û bi me re bimeşin.

- Belê, divê em wan bicivînin, Edê vegerand ...

Beko û Edê ji hev cuda bûn.

264

3- Li ser riya germiyan an

Jin dest hiltînin

Her tişt pêk hatibû. Hûnnûr li ser ga ku zaro ji her aliyê gund kom kiribûn, hatibûn bar kirin. Nêzîkî saet heşt, karwan, weke werîsekî dirêj û bi can hate ser rê ku lê giya şîn bûbûn.

Cangîr Beg, serekê êlê, qet guh nedida nîzama sovyetî û wek di wextê bav û bapîrên xwe de, an weke di wextê Taşnaq de, hereket dikir. Li hespekî sergenn siwarbûyî, mîna serfennandarekî, li ciyekî bilind sekinî û hişt ku karwan di ber wî re derbaz be. Gava dît ku hertişt saz bûye, hespê xwe yê boz ajot û kete pêşiya koçeran ku mîna dîwarekî, diherikîn.

Li paş keriya şivanekî, li ser milê xwe pezekî lingşkeStî hilgirti bû. Reben westiyabû û bi zor bi rê ve diçû. Pez ku xwe tim xwe tev dida, ji destê şivan filitî tl kete erdê. Çavê Cangîr Beg pê ket; hate cem şivên li

266

ser zengfiyên hespê xwe ji piya sekini 0 çiqas jê dihat bi qemçiyan rabOyê :

- Kerê mezin! Te çawan wêd vî pezili erdê xî? Tu lingekî wî ne hêja yî! Ezê şanî te bidim, sa, kurê sa!»

Rencberê reben, li bin derban tewandî, kire hewar:

- Mîrê min, min ew bi qesid nexiste erdê...Ew bi xwe ji destê min xwe derêxist, min ew ji dAr ve hilgirtin 0 ez ji teab ketibOm ...

Gotinên şivan ji beg re giran hatin; çawa rencberekî dikari bêedebî bike 0 li ber begê xwe xeber bide? Mecîd Beg hîn bêtir xeyidî, hespê xwe ajot ser şivanê reben 0 li bin qemçiyan ew avête erdê.

Gava şivan dît ku nedikari xwe ji destê wî xilas bike, xwe avête nav jinan ku gihaştibOn cem wan 0 xwe li paş wan veşart.

Cangîr Beg ji adet 0 isOlên kevn derneket. Ewî dizanî ku li sOcdarekî ku xwe davêje bextê jinan, êdî lê naxin. Di pevçOnan de, di kuştinan de, di şeran de, jin kefiya xwe ji serê xwe radikin, wê davêjin erdê 0 dibêjin: «Bi navê Xwedê, vê sînorê miqedes bigirin, êdili hev mexin, bela xwe ji hev vekin». Ûherdu neyar bi ya wan dikin 0 dev ji hev berdidin.

- Ji siOda xwe, te xwe avête pişta jinan, yan na, min şanî te bida! Kurê berêz, diya te şîrê keran daye te! ... Û Cangîr Beg hîn dom bi dujinan dikir ...

Ciyê herkes di êlê de gelek bi nîzam hati bO saz kirin : Li pêşiyê jinên dewlemendan, li hesp an ga

siwarbOyî, diç-ûn, bi çend gavan li paş, jinên feqîr, yên rencber 0 şivanan, dimeşiyan. Li pişt wan zarokên piçt1k girêdayî bOn. Ewên ku bê zaro bOn, barên welê giran hilgirtibOn ku, bi zor di bin de bi rê ve diçOn. Li dO wan, gayên barkin, hesp 0 çêlek 0 di dawiya gişan de, mî 0 bizin di riya xwe re diçOn. Dewlemend, şêx, melayên qure 0 nspî, li ser hespan, di her du alî re, li cem kifletên xwe, bi pozbilindî dimeşiyan.

Roj ronak 0 germ M. Jina Can~îr Beg a sêzde salf, Zedîne Xanim, li ser hespê, li cem l'rax, nivînên xwe yên hevnşim 0 micewheratan, diçO, di deryayên xeyalan de hêdî hêdî bi baweşînê mêş an kelmêş diqewirandin Oli cariyên xwe qîr dikir. Pezê keti, yê merivekî mêrê wê bO;ji lewre xanimê nedikan bêteref bimîne:

- Çima, ewê digote mêrê xwe, te ev bêbextê ha di cî de ne kuşt ? Ew giş êdî Mne wek guran ku li devi yan dinêrin. Bi tenê qemçî dikare wan bîne îtaetê, yan na ewê rabin 0 me biqurtfnin ...

Dengekî tevlihev ji êlê hildiM...Mî, berx 0 bizin dikaliyan, çêlek 0 ga dioriyan 0 ji her alî zaro 0 keçik pehîzokên xwe digotin ...

Gezo lêdana şivan diM. Lê ew bi roj anî ligundên ermenî xebitfbO, ketiM nav civınan 0 ewî baş dizanf hikmê sovyetî çiqas heqên xebatker 0 feqîran diparêze, ji lewre ew vîtiş1î qebaı nake, 0 gaziya reben, gundiyên

feqîr 0 gundiyên pî (yên ku halê wan diqede), da ku dawiya zilmê bînin.
270

-Li ser laşê piraniya ji we, ciyên qemçiyan hîn sax nebûne; lê nihu wext hatiye, divê hun bizanin ku ev hal êdî nema dikare dom bike. Nihu hikmê me ye, divê ku êdî beg 0 axa ji me bitirsin! Lê, ji ehmeqiya xwe wek gayên zexel heya nihu em xwe datfnin ber derbên wan, bêşan didin wan. Kê Cangîr Beg ji me re serek bijar-tiye? Çima sovyeteke me ya gund nfne?Em êdiji vihali têr bûne ...

Ev gotin ketin devê jinan ku, li bin barên giran dimeşiyan. Piştî wan, zilaman jî xwe gihandin dengê Gezo. Deng bilintir dibû û xelk lidora Gezo kom dibûn.

- Li zozanan Cangir Beg bi hesinekî li min xist, yekîdi~o.

- U ewi li ser min jî du dar şkênandin, çima ku min ji kaniya ku li nêzîkî konê wî ye av dibir ...

- Ev êdibes e! Em dikarinji heqê wan derkevin ...

Hempa Mihoyê Şemo hate nêzîkî cemaetê û gote wan ku nihu beg wê bê û hesabê xwe ji bo wan gotinan ewê bi wan re bibfne.

Xelk li dora wî bûn kom. Şivanekî bi laş û gewde kire qir:

- Wî ji hespê bînin xwar.

Ên mala me xirab dikin ev in; û ewî Miho ji pişta wî girt 0 ew ji hesp kişande jêr.

Li ser qîreqîrên Miho, Cangîr Beg, tifing bi dest, hespê ~we bezand 0 hate wê derê :

- Xwe ji hev bidin ali yan ezê berdim!

Xelk dev ji Mihoyê ji derbaketî berdan 0 xwe dan paş.

272

- Kê dest pê kir? Cangîr Beg ji cemaetê pirsî.

- Me giş, me tev de kir! Bi dengekî gotin.

Gava çavên jinan li Cangîr Beg ketin, singên konan ji ser barên ga kişandin û xwe avêtin wî. Di nav wan de bi navê Elmast, jinikeke bejin bilind hebû. Ew di wextekê de li malên Molokan xebitı'bû, piştre, gava vegeriyabû welêt Hikûmata Sovyetî erd dabûyê.

Elmast, singek di dest de, xwe avête Cangîr Beg û derbek avêtê ku çû lihespê wî ket. Heywan xwe hilda û xwe da alîkî. Gelek jin û mêrên din jê cesaret girtin û Cangîr Beg tehdîd kirin û ew revandin. Bîsteke dî, Pîr Ebas, çend şêx û dewlemendan,ji kitêbên miqedes ayet dixwendin û digotin ku li sereka rabûn guneheke pir, pirmezİn e.

Hingê Gezo derket ser tehtekê û dest pê kir:

- Hevalino! îro bi xwe, divê em zilamekî rêkin Eıfvanê, cem Misto da ku wî ji her tiştî ageh bikin. Divê ku em çekên beg, axa û hempa,ji wan bistînin. Hun giş, diçin û tên gundên ermenî û tirk û dizanin ku li cem wan, axa il muxtar nemane. Lê heya nihu li vir beg û hempa me dixeniqînin.

- Divê em, wek Cangîr Beg, dersa hempa jî bidin, Elmast dibêje, ew xulamên began in il her gav destê wan digirin,ji ber ku kolemayina me ji menfaeta wan e.

Çend hebên din axaftin ilqewirandina Cangîr Beg xwestin. Di vê gavê de, merivek xwe gihande êlê û xebera jêCÛlda :

274

Libiharê, gava berê pez didin zozanan, ev der dîsa vala dimûıin. Di vê midetê de, ev der dîsa têr çêre dibin o giya çiqas firk be jî dîsa bi feyde ye 0 pez dikare hemO zivistanê lê biçêre.

278

4- Fikrên nû

di nav milet de belav dibin.

Dema dayina xûkiya began 0 sixreyan wan hatibO. Egîd Beg bi xulamên xwe ji eşîrê re da zanîn ku herin ciyê pezê wî yê zivistanê çêkin; Cangîr Beg jî emir da êla xwe.

Gundiyên feqîr 0 pî (yên hinekî xweşhal), berê ku ji xwe re tiştekî bikin, diviyabO ku, mal 0 zar 0 zêçên xwe li bin ezmên bihêlin, bi mer 0 bêra herin şixulê began biqedînin. Gelek ji wan qebOl nekir, li dora Gezo civiyan û nerazîbûna xwe nîşan dan. Egîd Beg, qemçiyek di dest de, di ber koçeran re derbaz bO 0 bi awir liwan nên. Tu kes ji yên rOniştî ji bo ikraha adetên kevn, bi hatina wî ranebO.

- Xem nake, baş e, baş e, rOnin!. .. Egîd Beg gote wan. Di nêzîk de, ezê we ji bav 0 kalanên we bêtir bêxim bin hikmê xwe. Hun bawer dikin ku nîzama we 280

ewê dom bike, ne? Hunê paşê bibînin!... îngilîz a Taşnaq çermê we a yê xortên we yên komunist wê rakin ...

Tu kesi bersiva wi neda.Egîd Beg derbaz bû.

Li wi, aliyê wargekê, hempa, şêx a eşrafli cem Egid Beg diciviyan a bi saetan ve, şêwra hev dikirin.

Gava hin feqir û pi bi danîna konên began mijûl bûn komsomolek (endam eki ji xortên komunist) ji bo xwestina êgir çû cem wan.

- Here bixebite! ... Tu çi kan diki, tiralo, zilameki kal ku dixebiti gotê, ên li emrê bega ne em tenê ne ...

- Ez tu cara şixu1ê dijminên xwe nakim, komso-mol vegerandê.

- Ew ji ku dijminên me ne? Kalo heyin ...

Di vê gavê de Misto derket, gotinên wan bihistin û gote kalo:

- Dijminên me ki ne, ezê ji te re bibêjim; gotinên min xweş bêxe serê xwe, wan di nav nas û hevalên xwe de belav bike a wan ji li dijminên xwe rake. Eger em destê hev bigirin, em bi hev re heval û yek bin emê bikaribin zora wan bibin ji ber ku heq bi me re ye ...

- Min, dijminên me ki ne hin fehm nekir ? Kalo disa pirsi.

- Dijminên me yên pêşin a dijwartir beg, axa, mela, şêx û hempa ne. Bi wasiyeta adetên kevin, ew me ji xwe re dikin xulam a me ji bo şixu1ên xwe dixebitînin. Va ye binêr! Ewrên reş ji nihu de kom dibin; bisteke din, baran wê bikeve, kifletên te wê şil bibin; ji ber ku berê ku tu konê xwe deyni, beg te mecbûr dike ku tu yê pezê wi deynî. Em nikarin êdi bi 282

vî awayî bijîn. Li gora adetên kevn, divê ku em bê gotin serê xwe li ber beg, axa, şêx tl hempa xwar bikin tl guh bidin gotinên wan, ne ji ber ku ew zilamên qenc, xwenda, zana tl bi eqil in, lê ji ber ku bi tenê beg an dewlemend in. Emji aliyê wan çiqas tên êşandin tl kêm kirin! ... Li cem dewlemendan, kon tije mal û pere ye, lê, li pişta feqîran tenê kirasek dirandî heye. Divê ku em adet tl qanûnên xwe yên kevin bavêjin û êdî guh nedin şêxan ku timî dibêjin : "bi gotina mezinên xwe, began bikin" ; guh nedin beg tl axa ku emirên wek van didine me : «Dijî gudsiyeta şêxa tiştekî mebêjin! Ewê we kor bikin! ... » Û gava yek qala şêxekî, pîrekî an melayekî dike, beg wî davêje ber daran. Bi vî awayî ew hev û du digirin tlji feqîran xebat û Îtaetê dixwazin. Divê em van qanOnan ku ji aliyê beg, şêx tl melayan hatine danîn berdin tl qantlnên welê çêkin ku pê feqîr bikaribin bijîn û xwe ji bin istibdada axa tl şêxan xilas bikin. Çima şêx û melayên feqîr tune ne? Ji ber ku ew me icbar dikin ku em ji wan re bixebitin.

Berê, gelek miletên din weke me dijîn. Ew jî weke me koçer tl gundî bOn. Lê, ewan ben me fehm kirin, bi ziraet tl çandiniyê re seneat jî elimîn tl ji xwe re bajarên mezin çêkirin. Lê, em hîn wek berê dimînin. Em di koçeriyê de didin dû began, xizmeta wan dikin. Ev hal, mîna vê meselê ye: Herwekî bavekî du kur hebOn; yek ji wan, piştî ku hate dinê, midetekê di dergQşê de ma, piştre meşiya, mezin bû tl bOzilam. Lê, ê din tim di dergQşê de ma û tu cara jê derneket. Em wek vî kurê paşîn in. Ev çend hezar sal in ku em hatine dinê, lê em hîn di dergûşê de ne û em bi jîriya xelkê dijîn. Êdî, ji bo me jî wext e da ku em jî rabin ser xwe û wek

284

miletên din bijîn. Binêr, meselen, ligora adetên me yên koçeran, divê ku her Kurd konê xwe bi awakî miayen deynê, yan na, ji qanOnên ocaxê derketin, mal ft mal-bata wî tev de wê bine helakê. Lê, digel vê yekê, beg ft şêxên me, konên xwe bi kêfa xwe datînin 0 tu bela nayê serê wan.

Nexwe ev çima bi tenê ji me, ji feqîra re kifr e? Dîsa li gora adetên eşîrtiyê, divê ku her eşîr, her bavik, bi serê xwe bijî ft gava zilamek ji eşîrekê dibe dijminê zilamekî ji eşîreke din her du eşîr ji bo van her du zilaman dibin dijminên hev û ev tişt ne ji bo carekê an du caran, lê tim ft tim. Ûev pevçûn, şer û xwûırijandin, bi tenê bi kêrî' beg û axeyan tên. Heta ew bi xwe vê dubendiyê dixin nav xelkê. Bigir meselen, dijmintiya

eşîrên Ortlî û Kazan; ev çend sal in ku hevûdu dikujin ft bi ser de jî bertîla didin began, lê ev êdî eşkere bûye ku dijmintiya her du qebîle bi teşwîqa Egîd Beg dest pê kir. Dirbo, liber mirinê bi xwe got ku tu kes ji qebîleya Kazan li kuştina wî nedigeriya, lê Egîd Beg bi xwe fitne dabO wan; ewî bi guhê xwe bihîstibO. Hingê, Kazanan xwe avêtin wî 0 derba mirinê danê.

Çi xirabî û perî'şanî ji van tiştan diqewimûıin livê beriyê. Piştre, li gora adetên me, divê ku şixulên giran ft dijwar ji aliyê jinan bêne qedandin. Ew ji vî tiştî zû nexweş ft pîr dibin ft zû dimirin. Û jinanîn li cem me çawa çêdibe? Brayê xwe bigir, meselen: kal bûye û hîn heya nihu ji xwe re jin neani ye; ji ber ku pereyê wî nîne ft nikare qelen bide. Lê dewlemend bi xwe? .. Ha ji te re Egîd Beg: sê jinên wî hene 0 nihu jî ji xwe re keça Nado ya donzde salî xwestiye. Apê Cangîr Beg, Elî
286

Tahar 56 salî ye, lê di van rojan de, bi ~re, keçeke 14 salî ji xwe re anî. Kê ev qanfuı darune? Û kê gotiye ku dewlemend dikarin yekê bêtir jin bistînin gava ku em feqîr, em nikarin ? Bê şik, beg 0 şêxan ev adet 0 qanûn danîne.

Di her civînê de, min rakirina qelen xwest û we giş destê xwe radikir. Em hemû, rojek berî rojekê, rakirina qelen 0 ji vî nîrî xilaskirina milet dixwazin. Vê havînê, li zozanên Alagozê, di Civfna Mezin de, pîr, kal, keç û xort tevde, me rakirina qelen teleb kiribû.

- U, beg, ji bo vî tiştî çi digotin? Komsomol ji kalo pirsî.

- Çi digotin? Digotin ku ev bê imkan e, ku ev guneh e, ku Misto xayinekî dînê me ye, ku êwî ji xwe re jineke rûs aniye û simbêlê xwe kur kiriye. Wan rojê ha, êvarekê, beg lihev civiyabûn 0 difikirîn bi çi awayî xwe ji Misto xilas bikin ... ku ew ji sovyetan derxistiye o nahêle ew bikevin civînan.

Cemaet xwe ker kir. Komsomol demekê rama, piştre ji bêrîka xwe kaxitek derêxist û bi dengekî bilind, emrê lexivbûna qelen xwend 0 got ku heçî bi pere jinekê bînê, ewê bête girtin û 500 rûbil ceza wê jê bêne standin. Piştre, heta ku keçik nebOye şanzde û kurik jî hejde salî nikarin bizewicin. Ûdivê ku, di nav jin û mêr de ji LOsal bêtir ferq nebe. Ûdawiyê, qanûn êdî nahêle ku tu kes ji jinekê bêtir bînê.

- Bijî! Kalo ban kir û ji kêfa xwe mera xwe avête hewayê.

288

Kurdên ku bi îşên began mijûl bûn. hatin li dora wan kom bûn. Kalo ji komsomol xwest ku careke dî emrê lexivkirina qelen bixwîne. Ewî dîsa ew xwend û ji wan re her tişt da fehim kirin.

- Bijî Misto! Bijî Misto! Xelkê kir qîrin.

Mecîd Beg deng û kenên wan bihîstin. Rabû û ber bi wan ve çû. Misto bi gotara xwe ya birî dom kir :

- Û dijminê me yê duwem çiya ne, got û bi tiliya

xwe Alagozê şanî da. Belê, belê, welê li min menêrin, Alagoz him diya me, dayika me ya şîr e û him dijminê me yê pêşî. Wekî dêyek bê xem ew rû dide zaroyê xwe, wî hînî xebatê nake û piştre gava hêrsa wê radibe bi daran lê dide ; Alagoz jî rûdaye Kurdan û ew hînî tiraliyê kiriye. Tenê gava ku berf bibare û kerî ji sermayê bê hal dikeve çandiniyê dikin. Heke Kurd li gundan bi cî bibana, bi zeviyan mijûl bibana, ewê mecbûrî bixebitiyana û wisa çêtir dibû. Ewê wê gavê bizanibana ku ji bo zivistanê divê giya bê çinîn, ewê zeviyan bikêlîna û biçinina. Lê hun, her carê hun li ciyekî nû datînin û piştî demekê ji wê diçin ciyekî din. U zivistanê hun kêmasiya avê dikşînin. Ji ber koçeriyê hun û zaroyên we bê xwendin dimînin. Eger hun li gundan bi ci bibana ewê mektebeke we hebûna û hun dê hînî xwendinê bibûna.

. Du xortên şivan guhdarî dikirin. Gava navê mektebê bihîstin bi kêf li hev nêrîn.

- Ne wisa ye ey cemaet, ne rast e ku dijminê me yê pêşî beg, axa, şêx û mela ne û dijminê duwem jî koçerî ye ; em dikarin ji heqê wan bên der eger em baş bifıkirin û eger em hemû destê xwe bidine hev.

290

- Ev giş rast e, gundiyan tevde bi dengekî gotin.

Misto di cî de ew berdan Ü çü gundekî din.

Mecîd Beg hate cem koma feqîran; gava çavê wî li komsomol ket xwe nêzikî wî kir Üji serê wî heya

piyên wî1ê nêrf Ü bi xeyid lê kire qîr :

- Çima tu şixu1ê xwe disekinûıı"? Careke din, eger tu bê obeya min, ezê stuyê te badim ...

Komsomol qet xwe şaş nekir:

- Ji mêj ve êdî obeya te nemaye. Va ye obeya te!

Xort ev gotin Übi destê xwe şikeftek nîşan dayê:

- Emê te di nêzîkê de, bêxinê.

Mecîd Beg qemçiya xwe rakir Ü xwe avête komsomol ku li wî xe. Lê zilamên pîr Ü kal ku şixu1ê wî dikirin bi enir gotin :

- Destê xwe nedî vî mêrxasê ha, mîr, yan na emê aliyê wî bigirin Üemê te pîs bikin ... !

- Hun ij van zugirtên ha binêrin ... Ne bi tenê ji wan re qemçî1azim e, lê divê ku qftna wanjî bi hesinekî sorkirfbête dax kirin, herwekî Egîd Beg bi Şerqiyan re kir qîrfn zilamên beg. Ev bi xwe tiştekî nake Ü nahêle em jî bixebitin, zilamên began gotin, divê serê Misto jî bête pelaxtin, ewî hemÜ ev çîrokan derêxist!

Mecîd Beg sekînî, qebda xencera xwe givaşt û bi awir li xelkê ku gazin dikirin nêrf Ü minnirf: «Xem nake. Di nêzîkê de dora me wê bê 0 emê şanî we bidin, kurên sa ... !»

Komsomol bê deng vegeriya mala xwe.

292

5- Serhişkiya derebegiyan

dom dike

Roj diçû ava. Jor, li ezmanan, eylo, ji hev dûr, li

hewa hilavistî diman, weke ku bi çavên xwe yên tûj li nêçira xwe digeriyan. Car car ligirên rOtdengekî zirav û kûvi dihat; ev ji dengê eylokî çiyayî bO.

Konên began û govên pezê wan hatibûn danin. Şêxan ji konên xwe vegirtibûn. Ewrekî reş, liûfiq xuya kir; bayeki xurt ew ber bi warê koçera ve ani. Berf rojava, taviyeke xurt hat. zaro û hOnnurên ewên ku ji bo beg û şêx dişuxilin şil bûn.

Bayê payizê yê sar rabû. Zaro ji sennê dilerizin. Bi hatina şevê baran sekini.

Zaroyên beg, axa û şêx ji konan derketin, destên hevûdu girtin, stran gotin û reqisin. Zaroyên x~batkaran, di nav palasên şil de xwe pêçabûn û bi keser seyra wan dikirin ...

294

Hingê feqîran gotinên Misto anîn bîra xwe 0 heya sibê ji beg 0 axan gazin kirin 0 lanet li wan barandin.

Sibehî, roj tfrêjên xwe dirijandin li ser beriyê, 0 giya likirran, weke tayên hevrfşimê yên zirav diçirisîn.

Kirr, mîna şeveke zivistanê bi mirûz 0 mel61 in. Wek meydaneke şer, vir da, wê da ji hestiyên insan 0 heywanan, tije ne. Di wextê Taşnaqan de, Kurd 0 Ermenî, şoreşgerên bi tenê ku nedixwestin bikevin bin hikmê tifingên mawzer ên Taşnaqan xwe li wê vtX11şartin.

Roj hîn bilindtirM. Dewar û pezji şahiyê dibori-yan û dikaliyan. Hesp, bi hiskirina rahetiya germiyanê,

dişiyiyan. Jin jî, bi dilxweşî, li dora baran diçûn û dihatin.

Gava hempa, bi giranî piyase dikirin, da ku piştî' siwariya çend rojan lingên xwe yên tevizî rahet bikin, feqîran kevir hildigirtin 0 ji bo konên xwe cî dikolan. Zaroyên wan jî berx dibirin çêrandinê.

Cangîr Beg diltengî dikir ku zO here Yûsif Beg bibfne 0 jê re bûyerên rojên dawin bibêje.

Li ser hespê xwe, di şiverêyeke xwarO mar re, ser berjêr diM. Ji nişkave, ji nêzîk, ji pişt tehtan, keneke gurr kete guhê wî: jinên kurd dikeniyan. Cangîr Beg hespê xwe sekinand. Jê hate xwar û di şiverê re beziya çivanekan, giha erdekî bi sêlak ku diçO heya golê,
296

coyeke kl1r tê re derbaz dibl1. Jinên kurd jê av dikişandin, ji ber ku li wê, av ji ya golê paqijtir, cemidftir l1zelaltir ba.

Meyane, pişta wê li şiverê l1fistana wê ya şin lê, liwê disekim. Ji bin kofiya wê ya glover, ji serê wê yê piçl1k ber bi paş ve avêtî, 14 keziyên zirav l1 dirêj dihatin xwar. Ji dora xwe ne ageh, Meyane serê xwe dihejand l1dikem. Li ber wê, destên wi li kêlekên wi, xorteki kurd bi laş l1 gewde rawestaM. Ewi diranên xwe yên xweşik l1 spi mşan didan, brl1yên xwe digijgijandin liMeyane dinên. Bi xiftana xwe ya peritî, bi kumê xwe yê riziyayî l1bi piyên xwe yên nîvxwas, dirl1vê koçerekf kurd pê nediket.

Gava çavê wi li Cangfr Beg ket, çend pirs gotine Meyane, xwe xwar kir, şerbika xwe girt l1bi zerikekê dest bi dagirtina wê kir. Meyane xwe zivirand l1çavên wi rasti yên Cangir Beg hatin? ROyê wê, berê sor, piştre bO zer 0 ken jê winda ba.

Cangir Beg heyin, xwe hilda. Meyaneya wi, bi tena xwe, bi vi zilamê penşan 0 bi kincên periti re çi dikir? Ji xeydê, qirika wi hate givaştin. Diranên xwe reqriqandin, bê deng xwe nêzîkî Kurdê belengaz kir, şerbika wi jê stand li serê raqibê xwe xist. Bi milên wi girt 0 ew ewqas bi qiwet dehif da ku şivanê reben xwe ne girt 0 ket.

- Sa! Cangir Beg zuriya, tu ciyê xwe nas naki"?! Berê ku tu hin sax i ji ber min biqele.!

298

Kunnancê feqîr rabO, bi milê xwe ruyê xwe paqij kir, hineki ma, piştre rahişte dareki 0 Cangîr Beg tehdîd kir:

- Sa tu yî 0 bavê te ye! Ewî lê kire qîr, pişta xwe tew and ,ji şiverê xwe da ali 0 di nav tehtan de winda bO.

- Meyane ... ! Dengê Cangir Beg ê biri' dilerizî. .. Meyane ... !Teji bîr kir ku tudergistiyaminî?Teçawa diwêri' tu bi vî şivanê reben re xeber bidî 0 heta pê re heneka jî biki ... ? Maji îro heya du heftan ezê qelen rênekim bavê te ... ?

- Tuê çawa qelen rêki, ma êdî qelen maye ? Meyane heyiri', jê pirsî. Eger tu qelen bidî, li gora

qanOnên sovyetî, ewê te bigirin.

- Xem mexwe, ewê min negirin. Ezê qelen bi awaki welê bidim ku tu kes pê nizane ...

- Cangîr Beg, mîr im ... Meyane bi dengeki nizim gotê, ew şivanê me ye, hatiM avê 0 ari'kariya min kir.

- Lê, eger yeki ji eşîra me ew diba, di nav xelkê de îştixalî wê çêba, hingê ez mecbOr dibOm te berdim.

- Oh! Ez gori', min efO bike! Ew jî ne şivaneki adî ye. Ew jî ji maleke baş e. Bavê wî mêrxasê hemO eşîra Hesenî bO. Em bi hev re mezin bOne. Bavê min ew bire ba xwe,ji ber ku mêreki hêja ye. Carekê, nihu Meyane dibêje, ez bi ocaxa pîroz a şêx 0 pîr Ebas sond dixwim

"

ku ezê êdî li rOyê wî yê kirêt nanêrin. U Meyane bi giri'nê ket.

Bi dîtina hêstirên çavên wê, xeyda Cangîr Beg di cî de çO :

- Baş e, Meyane, bi dengekî şîri'n ewî gotê, ez te efO dikim. Ez bawer im ku ev tişt ji bo cara pêşîn bO 0 300

ku careke dî çê nabe ... Ezê emir bi dim xulamên xwe ku vî sêwlekî ji vir biqewirînin. Vî geniyê ha xwest ku bi êgir bileyize...Çavên xwe bimale 0 êdî megirî ...

Meyane 0 Cangîr Beg li hevhatin. Piştî nîv sae-tekê herwekî tiştek ne qewimîbO, Meyane, kOzê wê li ser milê wê, berê xwe dabO çiyê û Cangîr Beg jî vedigeriya ciyê ku hespê xwe li wê hiştibû.

Lê hesp li wê nebû. Kurdê êşayî, ji bo hilanîna heyfa xwe, ew revandibû.

Cangîr Beg hêrs bû; lê, tu tişt jê nedihat. Tu kes li wê nebû ku emir bidiyê û neyarê xwe pê bidê girtin. Bi peyatî xwe gihande konê Yûsif Beg.

Di nav warê koçeran de xeber zû belav bû. Kêfa feqîran gelek pê dihat û pesnê vî mêrxasê hêja didan ...

Beyarên çolê li bin tîrêjên rojê dişewitin. Di germiya bi rewrewk de, Ofiq xwe dilorîne û dilerize.

Li perava golê ya bi sêlak, konên Yûsif Beg ên reş xweş dixuyin Ali paş wan, wek komên giya, konên feqîran belawela ne.

Pez ji golê wê da diçêre, hesp li ber qiraxê, bi diranên xwe yên spî 0 xurt giyayên ter heya bi rehên wan ve jê dikin.

Bîst gava ji konê YOsif ê mestir wê de, ji mêvanan re konekî nA vedigirin, ji ber ku ji Yûsif Beg re dane

302

zanin ku Taşnaq (ximpabêtên kevn), wê bên cem wi.

DOyê agiran dirêj dibe, li ser yeki nanê lewaş lê dixin 0 li ser yekî din qelî dibirêjin. Seyran Xanim, jina YOsif Beg, ji xadiman re emir dide. Her der paqij 0 her tişt saz dikin.

YOsif Beg, bi giranî, li ser mehflirekî rOniştiye; li beriyê dinêre 0 çavneriya mêvanên xwe dike. Li cem wî, Cangîr Beg jê re dibêje ku di nêzîkê de, ewê dest bi bijartina sovyetên koçeran bikin.

- Tu dizani, Cangîr Beg, ku kurê min derêxistine? Nihu çOne cem Kurdên gundî 0 piştî çend rojan ewê bên cem me. Zor bide qebîlka xwe da ku te bikin serekê sovyeta xwe. Bi şêxa re bixebite ku feqîran bixapînin.

- Na, YOsif Beg, ev Mistoyê melûn hemO zugur-tan li ber me rakir. Tê gotin ku havînê ev Misto diçO 0 dihate vir, civînan çêdikir, timî lidijî me dixebitî 0 haya me ji tiştêkî nebO.

- Belê, Cangîr Beg, tu rast dibêjî. Gava Misto li gundê me rencber 0 feqîr civandin, em nexistin civînê o ji me re da zanîn ku êdî milet mezinahiya began 0 axan ya bi zor naxwaze 0 ku ji îro pêve ewê xwe bi xwe îdare bike. Û hingê şêwra gund bê me hate danin.

Di vê gavê de, ji gundê Qoçê karkirek tevî sê denên mey hate wê derê 0 got ku ji deşta Serderabad hin siwar ber bi konên koçeran ve dihatin.

Deşta Serdarabad! Çi ordiyên dijwar di nav te re derbaz bOne! Bi ser dirêjahî 0 pehnahiya te re, Taşnaq, 304

Tirlc Û firariyên ku çûn Û hatin. Te himbêza xwe ji wan re yek bi yek vekir. Lê ew, bêî ku li ser erdê te yê bê pîvan tu şopa bihêlin, giş winda bûn û çOn... Beriya ziwa û bê av, bêdengiya xwe ya giran biparêze ...

Kê bawer dikir ku livê beriyê ku ji ewqas insanan re bûbû goristan, rojekê, bi vekirina coya Serdarabad, eşîrên kurd wê bikaribin cîwar bibin. Ew Kurdên ku, bav û kalanên wan, bi sedan ve salan, di vê beriyê re bi

koçeriyê derbaz bûbûn.

Li beriyê hesp xweş bi teleb bi rê ve diçin. Li çola û li çiyan xebera hatina Misto û y/. Encimena Mintiqê ya Tenfizî ji bo bijartina meclîsên şewrê hin zûtir digehin gundan. Belê, li van çolên bi kevir ku ji zaroyên beriyê re bûne star, ta nihu xeynî hikmê sovyetî tu kes tu car nehatibû hawara feqîr û rebenek bi serêxwe.

306

6- Daweteke Eşîran

Gava bavê wî mir, Bro hîn gelek piçûk bû. Ji wî, jê re 20 pez, ga û hespek mabûn. Diya Brn, Besê, her gav digot: «Bavê te li ber mirinê gote min ku bi van pezan ez qelenê te bidim û jinekê ji te re bînim», û ewê bi dil û can li van miyan dinêrî.

Ji bo peydakirina dergistiyeke hêja ji kurê xwe re Besê gelek geriya, lê tim taba wê vala diçû; qelenekî giran dixwestin. Ji piçûkahiya xwe de, Bro, Meyane nas dikir û her du jî hej hev dikirin. Lê, Brn nediwêrî dilê xwe ji diya xwe re veke.

Carekê, di şeveke tarî de, gava Bro ji xebata xwe vedigeriya mal, rasti Mayene hat ku melûl û bi dilekî xemgîn diçû. Bi dîtina wê Bro lê kenî, silav lê kir, ew girt, ew kişande sîngê xwe, û ew maçî kir û TÛyêwê çima ewqas bêmad û çavên wê çima tije hêstir bûn, jê pirsî.

308

Meyane gotê ku Cangîr Beg ew ji xwe re dixwest.

- Ez kurê koçerekî bi şeref im, Bro vegerandê, ez dilê xwe naguhirim. Tu yê bibî ya min! Em tev de mezin bûne. Me bi hev re zarotiya xwe di zozanên Alagozê de derbaz kiriye û gotin daye hev û du. Çawa dibe ku nihu bêbextî li min bikıt Dibêjim qey piştî mirina bavê min 0 feqîr ketina me ...

- Na Bro, ez weke berê hej te dikim,Meyane bi giıingotê! Lê, libêsiûdiya me binêre ... Vî Cangîr Begê qereqûş ez ecibandime û bavê min dilê wî naşkîne û dibêje: «Ew beg û zilamekî dewlemend e; ewê qelenekî giran bide ... »

Bro gelek kûr rama; ewî dizanî bi begekî re şer kirin çiqas dijwar e, nemaze bi axayê êlê re. Lê, ewî di cî de xiste bîra xwe ku here ji di ya xwe re bêje ku qelenê Meyane bidê.

Li gora adetê, Besê apê Bro ezimand mala xwe û bi dizî qelen hate dayin.

Piştî lihevhatin û dayina qelen divê ku xort ji merivên dergistiya xwe re diyariya bidê 0 li ber wan bi zîrekî û xwînşêıini ya xwe jî xwe bi qiymet bikê. Besê ku, ciyê bavekî girtibû, li kurê xwe dinêıi 0 digot :

- Te dît, kurê min, min wesiyeta bavê te bi cî anî. Sibê, tu yê bibî xwedî jin. Ji îro bi şûn da, êdî tu bi serêxwe yî. Divê ku tu xwe bi xwe îdare bikî û ji hertiştî bêtir bala xwe bidê miyên xwe? Sivik, pozbilind mebe. Gava tu diçî nav eşîrekê ku zilamên wê bi çavekî ne

divê ku tu jî wek wan bibî û xwe bielimînî adetên wan.
310

- Baş e, dayê, Bro vegerandê.

-Ûnihu emê bi mêvanên xwe mijaı bin; gelo ji her kes re topay (xomçe) hatin rêkirin?

Li gora isûlên eşîrtiyê divê ku desgirtî ji her vexwendiyê dawetê re topayekê bişîne: destmal, sabfuı, êlax ... Ewê ku dil dike bê dawetê, diyarî qebûl dike, yan na wê nastîne.

- Belê, yadê, me ji her kesî rêkir.

- Gelo diyarî wê têr bikin?

- Herê, dayê, ewê têr bikin; ji L\~rku apê min ji bo daweta min heft pez dan min. Ewî baş dizanî ku em bi tena xwe ji heq dernediketin ...

Roja dîtir gundê Bro nedihate naskirin; gelek mêvan hatibfuıê. Dawûl 0 zirne dengê xwe yên bilind digihandiiıciyê dûr. Merivên Bro giş li wê bûn. Gundî, bi xiftanên cejnê û bi kum û destmalên xwe yên ren-gareng bi kêfxweşî, ji konekî diçûn konekî din. Di nav wan de, jin bi fistanên cejnê yên giranbiha û bi neqiş, bi delalî dikeniyan. Li serkofıyên delalên çiyê, zîv, zêr û guhar diçirisîn.

Li wî aliyê gund tevdaneke din hebû. Li wê jî, siwar ji bona cirîdê civiyabfuı. Her yekî ji wan zor dida xwe ku hinerên hespê xwe pêş xelkê bike. Hineka bi hev re şert digirtin û hin jî li ser esi1bfuıa hespên xwe isbatên rengareng derdixistin.

Dawiyê, beza hespan dest pê kir. Meydana hespan 10 kîlometir dirêj bû. Siwar bi çargavên piçûk,
312

gava digihaştin serê meydanê, bi dengê zirneyê zîz û qayde siwariyan dixist bi hespên xwe cenbazî û hinerbaziyên dijwar dikirin.

Xelkê bi vî awayî kêf dikir. Di vê gavê de, Bro li ser textê zavatiyê rûnişuôû. Xortê ku li dora wî civiyabûn distrandin, direqisîn. Hineka serê wî kur dikir, ew dixemilandin û cilên xweşik lê dikirin. Li gora adetên Kurdên aliyê me, pôrê wî bi derece dibiıi'n; her hevalekî wî diçû cem berber, pere didayê û je dixwest ku para wî ji ya yên din zûtir biqusîne. Perê ku bi vî awayî kom dibû diçû sendûqa xortan.

Emê bêne Meyanê: ew jî di bin kon de, bi hevalên xwe re rûniştibû. Ewan cilên wê lê dikirin, û li gora adetên kurdî, digiıi'n jî.

Yekê ji keçika stranan cil wergirtina bûkan digot :
Em xeıfb in, bi tene ne
Li ber male n1niştî ne
Tu kes nizane em kîne
Wey li min xen'M, wey li min pepOke
Ez mala bavo dibînim
Bane sen kevn dibînim
Li xwe me de zava xorte
Ez bi tene xen1J im
Va ye ez diçim, Mî hew tem mala bavo

Digrfm 0 xatire xwe dixwazim
Ez bi tene xen1J im
!
314

Ez destmaleke sor im
Di nav xen1Jan de qor im
Jar bikeve nav wi nanê
Ku diya min dida min
Ji bo qeleneki min rebenê
Difroşin kaleki geni

Piştîhermisra, giş digiriyan. Lê digel vê yekê, her yekê ji wan digote Mkê: «Tu çiqas bextiyar î! Mêrê te xort 6 çeleng e. Lê, em bi xwe hîn nizanin çi bête serê me? Dibe ku, em jina sisiya, an çara ya kalekî genî bibin? Hingê bê dilê xwe emê mala bavê xwe berdin 6 ji dil hêstirên çavan birijînin » ...

Ber bi nîvroyê ve, gund hinek bê deng M.Meyanê siwarî' hespekî kirin 6 bi hevaltiya siwaran, ew birin mala Bro. Li ber derî tifinga berdan 6 diya Bro, di her destekî xwe de du firax girtin 6 reqsa koçerî kir. Gava Meyane di şîpandeyêderbaz diM k6zek danîn ber wê; ewê ew şikênand 6 kete hundirê malê 6 dawet jî li wê giha dawiya xwe. Deryaya dengê Meyane xwe ker kir. Herkes ç6 mala xwe 6 her der bê deng M.
re

Eve saleke ku ~eyane mêr kiriye. Li gora hesabê wê, ev sêzde heyiv in ku hatiye mala Bro. Bi tenê, piştî

zewaca xwe bi midetekê, Meyane dikarî' rayê xwe veke, xêlî jê hilîne 6 bi xesOya xwe re xeber bide.

Cangîr Beg Meyaneya delal ji bîr nekiriM. Gava xulamê ku ewî rêkiriM cem bavê Meyanê vegeriya 0 n6çeya zewaca Emînê bi Bro re anî Cangîr Beg sond xwar ku ewê Bro sax nahêle du dafıkekê de bikuje.
316

Saet pey saet, roj pey roj, meh pey meh diçün; Bro bi kêf 0 di1xweşiyê bi Meyanê re dijî 0 diya wî jî licem bOk ü kurê xwe di derya bextiyariyê de ajinî dikir.
318

7- Demeke nû dest pê kir

Bihar nêzîk dibe. Wa dixuye ku roj li ser erdê, bi tîrêjên xwe yên zêrîn, dixwaze her tiştî bişewitıÎle. Teht û girên wargeha zivistanê ên zer diçirisin. Giyayê gangez gurr heşîn dibe.

Li bin kon agir hêdî hêdî pêketiye. Çend Kurd li dora wî civiyane. Siha simbêlên wan ên dirêj dikeve ser rûyê wan û çavên wan ji guriya êgir diçirisin. Pir hêdî, weke minnira avekê, bi hev re xeber didin :

- Gelek baş e! Bi vî awayî, Edê, li ser çêre, milk û bêşa dest bi axaftinê kir. Carekê bînin bîra xwe, ewî digot,ji destê van zaliman me çendîn sal ezab û perîşanî kişand! Erd û çêreyên baş di destên wan de bûn û bi ser de jî tu bêş nedidan. Lê, ji me bi xwe, her tiştê me distandin. Nihu, her wekî Misto digot, emê her tiştê

wan bistînin, erd û çêre wê bikevin destên şewrên koçeran.
320

Edê, dûr Û dirêj behsa gelek tiştên din kir, piştre, blOra xwe girt 0 ew danî ser lêvên xwe. Weke tîrêjên roja geım, ahengên wê bayê beriyê dadigirtin, diketin nav konan, ji jin 0 dergistiyan re, şadî dibirin 0 delalên wan tanîn bîra wan.

Feqîran, demeke dirêj ji serbestbûna xwe re strandin û reqisîn. Ber bi sibê ve, dengê blûrê hate birin û xelk ji hev belav bû.

Ji nişkave, warê di xew de, bi hewar û qîrînên bilind şiyar bû. Zilamên niv-tazî an bi kiras û derpî, ji konan derketin çûn navrasta war. Di nava meydanê de peya kom bûbûn 0 xwe tev didan; tu kes nedizanî behsa çi ewqas bi geımî dikirin? Tu kes sebebê hewara wan seh nedikir?

Lê, wa ye, siha merivên beg 0 axa ên bi gazin! Li dû wan jî, pîr û şêxên rêhdirêj xuya kirin.

- Ho, ehlê dîn! Evane dest pê kirin. Xwedê Teala ji me re belakî dişîne. Ne bi tenê bikim kete destê xwedênenasan, lê nihu jî beg, qewal 0 şêxan digirin, dînê pîrozê Melekê Tawis tê rakirin. Em nihu giş liber helakê ne! Sebebê van tişta gl'Misto ye, de herine wî ji ortê rakin 0 heyfa me jê hêlînin!

Lê gundiyên feqîr, ciwêlek, rencber, pale û pîji vê nûçeyê gelek kêfxweş bûn û bi lez û bez dîsa vegeriyan

malên xwe. Li meydanê, bi tenê beg, pîr, şêx, meriv û xulamên wan man.
322

Şeveke şfnê tari, şeveke bi çavên şin, erd xiste himbêza xwe û her tişt xwe kerr kir.

Ennenistana Sovyetî ji Kurdan re gundên nû ava kirin. Li şûna konên reş û kadin a holikan, nihu bi du, xaniyên wan ên bilind, bi pencereyên fireh û rom hene.

Feqir, ciwêlek a pi ji xwe re kolxoz pêk anfne a xwediyên mal û milk bûne. Genim tov dikin û diçinin. Di kolxozan de makîneyên to, penir a nivişk hene.

Di nav Kurdan de, karkerên bijare Q pispor hene. Giş endamên kolxoza ne, an şivan in. Xort hema di partiya komumst de ne û ketine dibistana. Pir ji wan di zanfngeha seneat an ya febrfqan de dixwfnin. Hin ji wan di zanfngehên Lenfngrad û Moskova de dielimin.

Nihu, li ciyê ku berê warên koçeran bûn, jineke sosyalist a nû dikele.
324

Ereb Şemo
Di Şivanê kurd de
Ereb Şemo, bi awa-
yekî gelek xwezayî
û sade, û ne bê şiîr,
bûyerên her roj,
jiyana eşîrên kur-

dên koçer bi me
dide nasîn. Mirov
ewê nikaribe van
nivîsaran bê heye-
can û bê eleqe bi-
xwîne, nemaze ji
ber ku êdî îro ev orf
û adetên sedsalan
di piraniya Kurdis-
tanê de li ber win-
dabûnê ne.

le Berger kurde,
Ereb Chêmo, avec
beaucoup de naturel
et de simplicite et non
sans poêsie, nous fait
connaître, dans les
de tous les
jours, la vie au grand
air des tribus no-
mades. on ne lira pas
cesrecits sans emotion
ni non pI us sans
interêt, d' autant plus
que ces coutumes se-
cu1aires ont pratique-
ment disparu dans la
majeure partie du

Kurdistan.
INSTITlIT KURDE DE PARIS
85 FF
ISBN 2-908416-018
**

SÎLAV Û MÊRÊN WÊ

Roman

(te ez fêrî evînê kirim)

Hesen Îbrahîm

— Kevalê bergî: Fehmî balayî-GeI erîya dihok

— Derhênana hunerî: Govend umer

— Tîraj:

— Jimara spardinê:

Mêvanê bejna bilind

Şev dirêj bû, bi dawî ne hat. ew jora cihê wî lê, ya bûye zîndan. ew oksîcîna berî bêhnekê, sîhên wî geş dikirin. Nihu ya bûye jehir.

— Şev dirêj bû, sebira min nahêt.

Wêneyê wê, bi kiras û fîstanên bûkanîyê di nav perwazeyekê zer, di komodîna jora

rûnişti^da bû. Kenîya wê, perwazeyên xwe şkandîneı

— ey hewar... Tu çend ciwanî? Tu çend nazik û şirînî?

Tarîya şevê neşêt ronahya çavên te kiz bikit.

Wêneyê wê, da ber sîngê xwe. Çavên xwe neqandin. Bêhna wî teng bû. hest bi henaseyên wê

kir. Li pişt xwe zivirî.

— eve cihê wê bû. iha li vê derê rûniştbû. eve şûn zendên wêne .eve şûn tilên wêne .i ha pişta xwe da bû vê derê...

Axxx, bêhna wê tijî jorêye . Kenîya wê tijî bi van dîwaranveyei

Min têr nedît. Min têr ne axavit. Min çu xweşî bi kenîya wê nebir. hindekên dî beşdarîya min dikirn. ew xweşî ne bo min bi tinê bû.

ez jê têr nabim, kengî dê bite roj? Kengî dê bînime ve?

Wêne bilind kire ber çavên xwe.

— Kengî? Kengî?

ew çend roj bûn karê xwe dikir, ka dê çawa li beranberî wê rawestit?! Ka dê çi bêjitê? Ka dê çawa çite destî? Ka dê çend destê wê mînte di destîda?

Ge i ek caran, beranberî xwedîkê, pirove dikirin. Dida bersîngê xwe? rûyên wê maçî dikirin. Di nav sîngê xweda digivaşt.

Li roja dîtinê, li roja keiîye beranberî çavên wê. Dergeh vebû. hemû tişt ji bîrkirin. Çu li bîrê nema, kes li pêş çavan nema. Ke?e beranberî bej na wê ya caran. her ew bej ne ,her ew dêmê tijî hîvîye .her ew nêrgiza geşa carane. Çavên wî ketine çavên wê yên tijî kil. Wek megnatîsî kêşane xwe ^şta mêyatî jê dizêt. Birûyên wê wek du kivanan tîr jê dipeşin. Şert cîhanê dikin. Lêvên wê kanîya evîndaraye.

Beiira e. manîya hindek ji spîyatîya xwe. bo rüyên wê kirîye dîyarî.

her ew mêkewa carane ,her sîngê wê yê har, li berahya wê direqist. hêşta ew coka di nîva memkên wêda, ewa ge . ek tolaz pê dîn kirîn. hêşta xuhdayne. !

Ne mêrê xirab, û ne salên xerîbîya dijwar şîyayne şûnti^n xwe li dêmê wê yê mê dîyarbikin. Destê xwe. bêy ageh ji xwe hebit, kire di destîda.

Nezanî çawa silav kir. Nezanî çawa bersiv da. Çavên wî ji lêvên wê venebûn.

Destê xwe ji nav destê wî kêşa der. Wî divîya destê wê ge . ek di destîda bimînit, divîya çavzlkanê li ge . wan çavên be. ek bikit. Divîya têr bêhna wê hilbikêşt.

ew ya bi lez bû, destê wî zû berda.

— hûn ge I ek bi xêr hatin.

Wek mendehoşan, nezanî dê çi bikit, dê çi bêjit.

hevalê wî milê wî girt, bire di jora mêvananvei

— Supas... Biçûk çawanin?

— Keremkin.. Ge I ek başin, supas.

Çavên wî ji çavên wê venabin. Çu suhbet û axiftin jê nahêtl

her wekû li ser komeka petan rûniştî. Ge I ek caran, karê xwe dikir, da suhbetekê bikit, neşîya. Divîya ge I ek pirsan bikit, neşîya. Divîya xwe di nav pirça wêda veşêrt, neşîya. Divîya xwe pavête ser sîngê wê yê har, neşîya. Bêhna wî teng bû. her çendekê di nav hizirên xweda berze dibû.

Pêlên kenîya wê ya tijî hêroyîn. Gehên mejîyê wî diazirandin. Livîn û hatin û çona wê hêza dilê wî dijwar dikir.

Li hindav serî rawestîya...

Bej na xwe ya bilind çemand, her du memkên wê girêl bûne ber derê kirasê wê yê kurt, ewê ji bin penteronê kabûy derketî. Li ge I livînên wê yên har. Navika wê û kemaxên wê, wek betira serê çîya dîyar dikirin. Bi tilên xwe yên nazik, peyaleya çayê dana bersîngê wî.

— Keremket

Peyaleya çayê bilind kire ber devê xwe, du qurç lêdan û dana cihê wê.

— Bibore kak... Min şekir nekiryê. hevalê wî derdê wî dizanit.

— Jê bigere ,ew çayê, tal vedxut.

Şev dirêj bû...

— Şeva hewe xweş.

— hêşta zûyet xewa min nahêt.

— Direnget sube me kar heyet dê biçûk çine xwandingehê.

Şev bi dawî nahêt. Xew sil bû.

— eve çend sale ez li hîvîya vê şeve me. Min Mirad bû ji nêzîk bibînim. Min Mirad bû, li ge I rûnim. Nihu di navbera min û wêda, ev dîwareye. Dîwarê berlîn herfandin. Dê kengî vî dîwarî herêfin? Dengê dilê wê tijî guhên mine. Dengê guhnêlîya wê dibin mêrê pîs ve.

Mej iyê min hêra. Bêhna wê ez ser xweş kirim. Çi bikim? ey hewar ?!

Dê kengî bite roj? Dê kengî ev dîware rabit? Dê kengî vî dergehî vekit û bêjite min spêde

baş?

Çi bikim? Biçime jora wê? Xwe berdme di nav nivînên wêda?

Xew dirindeyekê hare. Leşê wî yê wastîyay dagîr kir. Di nav pêlên xwe yên harda bire xwarê

ew dîwarê di navbera wanda, bû şûşe. Leşê wê yê wek masîyê, di ber bej na mêrîda dirêj kirîye . Xirxira mêrî, xew jê sil kirîye .

Destê xwe li dîwarê şûşey da. Çavên wan ketine êk.

— Were. .. Xewa min jî nahêt.

Dergeh vebû. Sîlav bi cilkên şevê yên nîv rûs, hilda jor.

Divîya ji pêşve rabit.

— Ranebe. Xewa min jî nahêt. Dê hêlî di nav nivîna te da binivim ?!

Deng jê nehat, çavên wî bersiv dan.

Lihêfa wî rakir,cihê xwe li ber tenişta wî kir. Germa ^ê wê, hestên wî yên nêr hişîyar kirin. Çavên wan ketin êk, lêvên wan ketin serêk. Bêhina sîngê wê tijî mejyê wî bû.

Destên wan bûne destên robotan. Kitkte. cilkên êk havêtine bin pên xwe.

Du ^ên rûs, di xuhêra ter bûn. Dengê şe^ evîna wan, livîn û bizava wan. Mêrê wastîyay, li jora dî hişîyar kir.

Li hindav serê wan rawestîya. Berî daxwaza lêburînê jê bikin.

Dengê biçûkan ji wê xewa xweş û bi tirs hişîyar kir.

Mal tijî denge. sîlav karê biçûka dikit, da biçine xwandingehê.

Rast rabû ser xwe. Birîyar da vê spêdeyê, ji xwe, nekit. Dibit êdî neşêt hosa ji nêzîk bibînit.

Dengê sîlavê ji jora xwarnê hat.

— Mirad, heker te biçûk birine xwandingehê, bo me hindek nanî û pêxwarinan di ge I xwe bine.

Dilê wî zêde xwe quta. Jîyê wî bû çarde sal. Neşîya xwe di nav nivînên xweda bigirt.

— Dê bi tinê mînit.ez û ew.eve roja mine. Dê hilo, ewa eve çend sale tu lihîvîyê, nihu bi tinêye. li benda te ye. qebê te dixwazit. Dê hilo xwefmêr. Dengê girtina dergehî, xwîna dilê wî lezand. Serê xwe ji jora xwe înader. Bej na zirav di jora xwarnê veye. §ewqê didit.

Wek dizan, xwe nêzîk kir. Nevîya wî dîmenê ge I ek ciwan û şirîn têk bidit. Nevîya pirça wê ya tarî ji wê dîlana li ser milan dikit, bêbar bikit.

Lê wek pelatînka aşiqa ronahîyê, neşîya xwe. Divîya di nav pêlên agirê bej na wêda, xwe bisojit.

Çi bibit bila bibit, tinê ji vê xwekujtinê bêbar nebit.

— Sîlav, sîlav..

Bi tirseka şermîn li ser milê xwe zivirî.

— Keremke kak hewar? Spêde baş.

— Spêde baştir. Mirad ço derê?

— Be ! ê. Ço biçûka bibite xwandingehê. Dê zû êt, te xêr bû?!

— Bibore ,ez şevêdî nenivîstîme.

— Wey tu bi xwedê kî?! Cihê te nexweş bû?

— Ne ne. Dilê min nexweş bû.

— Dilê te.!

— erê. Sîlav dilê min nexweş bû. Sîlava min. Te ez jibîr kirim?

— Bibore kak hewar, ez di te negehştim?! ez niza...

Destê wê girt, divîya danite ser dilê xwe. Zû destê xwe ji nav destê wî îna der.

— Zehme. nebit, xwe dûr bike. nihu dê mêrê min êt û...

— Mêrê te .. .ez baş dinîyasim û tu jî wî baş dinîyasî.

— Bibore. Zehme. nebit here di jora xweve.

— ez ne hatîme binivim û bixum. ez ji ber te hatîme .eve çend sale ,ez li rojeka hosa diğerim. ez li te digerim. Tu li min berze bûbûy. Min tu dîtî. ez bi sanahî te bernadim. Dê gîyanê xwe gorî te bikim.

— ez ditênagehim tu çi dibêjî?! Min ageh ji te nîne . Be I a xwe ji min veke .ez neya wan karame. Tu şaşî.

— Sîlav., dilê min, ez nehatîme bi zorî yan bi pare yan bi hindek rêyên necwan vê daxwazê ji te bikim! ez daxwaza evîneka paqij ji te dikim. Baş bizane ,her ^tê te nevêt, her ^tê ne bi dilê tebit, ez nakim û bi mirina mine.

— ez hlivîdarim dûr bikevî. Nihu dê Mirad êt. Bila me hosa nebînit.

— Tinê min divêt destên te bigirim. Destê te danime ser dilê xwe . Te bidime ber sîngê xwe . ez ge I ek ji te xerîb bûyme.

— Bibore .ewa te divêt, ez neşêm bikim, ew ne karê mine.

— Sîlav.: Baş bizane min xirabîya te nevêt, tinê ez neşêm bê te bijîm.

— Ma tu min û halê min nabînî?! Mêr û biçûk û...

— mêrê te pîvazekê naînit.

— Û biçûk û xe! ik û.?

— kesê ageh ji me nîne. Ma carekê xe . kê pirsa halê te kirîye?

— ez neşêm, ji min bigere.

— ez jî neşêm bê te bijîm.

— Te mal heye, te biçûk hene .

— Min tinê tu divêy. Min dilê te divêt. Min çavên te divên. Min kenî û keyfa te divêt.

Min...

— Bibore .ez ne şêm. ez ne kiça çarde salî me .ez xwedan mal û mêr û biçûkim. Ma tu nizanî?

— Sîlav.: Tu baş dizanî ez çend hez ji te dikim. Tu baş dizanî tu bûye beşek ji jîyana min, tu di xwîna dilê min da, bûye vayros. ez neşêm xwe jê rizgar bikim.

— hêdî hêdî, te xêre. Min ageh ji te nîne .ez te baş nanîyasim. ez di nav xem û biçûkên xweda berze bûyme. Ma tu halê min nizanî?

— ez hemû tiştan ji jîyana te dizanim. ez malbaba te û ya mêrê te jî baş dinîyasim, lewma dilê min bite sot. Lewma min divêt te ji nav destên wan rizgar bikim.

— Ma ez çi bikim? eveye bextê min ji dinîyayê.

— Bextê min jî ji dinîyayê, ez neşêm bê te bijîm.

— Bibore, min demê van gotinan nine. Jîyana min hemû xem û nexweşîne .ez neşêm hindekên dî jî, li xwe zêde bikim.

— ez ji ber wan xem ü nexweşîyan, xwe gorî te dikim. Min divêt barê te sivik bikim. Xemên te sist bikim. Tu hest bi jîyanê bikî, bikenî, bijî, bi hîvîbî bî. Tu bo kê xwe disojî? Tu bo kê van xeman hildigirî?

— Tu çi ji halê min nizanî, ez mirîme!

— Dilê xwe vebke, bawerîya xwe bi min bîne. Bo min, ji dil baxive, dê dilê te tenabit.

— Piştî çi?

— Ma çi çoye ?hêşta tu wek bûkekêy.

Bişkurî, divîya bikenit. Berê xwe da dergehî.

— Supas bo van gotinan. ez ne li hîvîya çu xweşîya me.

— Were da pêkve van çend salên ji jîyê me mayîn, bi xweşî biborînin.

— ez neşêm, çîroka min dirêje.

— Çîroka xwe bo min bibêje da bikime roman. Ma tu nizanî ez romannivîsim?!

Kenî, kenîyek bi tirs û şermîn. Hezên wî yên nêr harkirin.

— Bawer bike dê bite dirêjtirîn û nexweştirîn roman.

— Bila, da evîndarên piştî me bo xwe mifay jê werbgirin.

— Be ! aya xwe ji min vebike. Ya te divêt, ez neşêm bikim.

— Tinê min kenîya te divêt.

Cih jitlîlîyên kenîyê pir bû, evê carê ji dil kenî û her bi kenîve got:

— heker tinê ya te divêt kenî bit, ew bi sanahye.

— Tinê min kenî ji te vêt. Lê divêt ew kenî ji dilê te derkevit.

Serê xwe hejand, axînkek ji kûratîya dilî derket.

— ew zehmete t Dilê min ji xeman piret Kenîya min, tinê ji devîye t

— Dilê xwe vebike, bila xem derkevin, keyf û xweşî cihê xem û nexweşîyan bigirin.

Berê xwe da navçavên wî, tirsa wê verevî. Xwe pitir nêzîk kir.

— Nuke te çi ji min divît?

— Min dilê te divêt, min kenîya te divêt, min çavên te yên reş divên, min...

— Wey babo! Pa te çi bo mêrê min hêla?

— Pêkên votkayê û hevalên wî yên wekü wî.

— eve nesîbê mine, eve bara mine ji dinîyayê.

— Wenebêje .ez nesîbê teme, dilê min bara teye,

— ez neşêm, li min bibore, Tu bira û hevalekê xweştivîy.

— Min jî her hind divêt. Min ew bawerî divêt. Da ez bişêm te ji vê bêomêdîya tu têda derbêxim. Jîyan hêşta li pêşîya te û...

— Jîyana çi? Halê çi? ez pîrbûm, min çu nemaye bo bijîm.

— Wene bêje , Tu di koka gencatîya xwedayî. Tu hemû hêz û jîyanî.

— Tu nizanî çi hatîye serê min.

— Min divêt bizanim. Bo min bibêje, da tu jî tena bibî û da bikime roman wek min gotî. Dîsan kenî, pitir bawerî peyda bû, tirsa wê nema, suhbeta wan xweştirbû.

— Tu rast dibêjî, dê jîyana min kîye roman?!

— erê û baştirîn roman.

— Dê hema dest pê bike,

Tijî navçavan keyf û hlivîbûn.

— Navê wê bikime çi?

Pişta xwe dayê, bi kenîyek şermîn ve,

— Bike sîlav..

— Sîlav.?! Navê te?!

— erê navê min. Ma ne xweş nave?

— Ge I ek xweş nave û...

— Lê hişîyar bel

— Nelirse?

— Tirs? Ma min çi maye jê bitirsim?

Destên xwe perxandin, her wekû qirêja çend salan jê didite bay.

— Divêt tu harî min bikî.

— Çawa?

— hindek ji jîyana xwe ya biçûkatîyê, hindek ti§tên veşartî, hindek ji evîna xwe ya jîyê herzekarîyê.

— Tu hemû tiştan ji min dizanî, wek te gotî. Min çu tijtên veşartî nînin.

— Û evînî?!

— Bawer bike min evînî nekirîye?

— ez bawer nakim. ev ciwanîye û ev xwîna şirîn, şîya bin te ji evînîyê bidizin û...

Nehêla axivtina xwe xilas bikit:

— Raste û supas bo çavên te? Tu min wesa dibînî. Lê ez ne gehiştim evînîyê bikim. Min ew dem ne dît.

— Dê were da nihu bikin.

— Nihu?!

Kenîya wê tuxîb bezandin, gehên ^ê wî harkirin.

— erê nihu. Min jî evînî nekirîye .em dê ji evro pêve dest pê bikin.

— Piştî sê biçûk û du mêran?! Dê evînîya çi bikim? Tu yarîyan bi min dikî?!

— Min jî jin û sê biçûk hene .ez jî wek teme?

— Ge I ek zehmele?

— Ge I ek bi sanahye.

Kenîya sîlavê

Bajêr, biçûke. rengê gundan didit. Cadeya serekî, dilê bajêrî dikite du ker.

hindek dikanên bêseruber, lêvên cadeyê kirêtkirîne .her kesê carekê vî bajêrî bibînit, dê

bêjit: ev bajêre ji bermaykên §erekê mezine .hê§ta xanîyên wan, yên serdemê gencatîya wanin.

Li bajêrî hemûyê, du sê xanîyên bûyaxkirî nînin. hemû li hîvîya birîyareka taybetin, da bajêr serubin bikit, kolkên wan bikite bêlayên mermerî.

Hukmeta berê nedihêla kes ji kevlojankê xwe derbikevit. Li azadîya evro paxlên wan divalane. Tinê difên nanê rojane peyda bikin.

Ji ber biçûkatîya bajêrî, xel kê wê, hê§ta xwe wek gundîyan dihjmêrt. hemû, baş ya nîva mala êk dizanin.

Li vî bajêrî, kes neşêt çu nihênîyan veşêrt. Kes neşêt, xwarinek xweş bêy cîranan bixut.

Bajêr hişke. Darubar lê şîn nabit. Ne kanyeke. ne rûbareke. ne çem ne bîstanin.

Ji hişkatîya bajêrî, ji bê avîya wî, ji nebûna cihên taybet, tolazên wî li ser lêva cadeyê, wek polîsên zêrevanîyê, çavzilkanê di gel ebareşan dikin.

ew sê çar mizgevet, ew sê çar çayxane û sê çar baregayên partîyên sîyasî, neşên gîyanê wan yê pirbizav têr bikin. Karê rojê dikin, bi şev li ber te I evzyon û dengubasên dubare dixun.

Li roja dî li hîvîya eba^ekê dimînin, heta carekê kenîyeka zer ji lêvên êkê bibînin û bikevte davên wan yên pêtî.

Tinê çend kiçekan, xwe gorî pêlên pêşketinê kirnet Şîyayne wî ebayê reş pavêjin, bej nên xwe yên zirav bidine bayê lekulomeyên dinîyayê.

Lê hêşta kesê ji wan kiça, ew dil û ew cerg nebûye û neşîyaye li nîva bazarê biçûk û bêseruber, kenîyeka şêtaneı wan tolazan har û dîn bikit!

Kes nema li ser hişên xwe, kes nema li dor xwe nezivirî, kes nema ew karê di destîda nehêlaye bi rêvet kes nema gehên ^ê wî nêrnebûyîn, kes nema dev lê beş nebûy.

Berê hemûyan kete cihê kenî jê zay, cihê wehî jê hatîye xwar.

eve bajêrê nêrayet Bîra kesê nahêt, li vî cihî û li vî demê rojê, guh li kenîyeka hosa bûy!

Ge I ek ji wan dikandaran, di nav kevnehizirên xweda gerîyan, gel ek birne rojên xweş. Ge I ek di nav wan kevnehiziranda ketin di zivroka evînîyêda, ketin ber singé xwe§tivîyên xwei Ge I ek jî birine ser kel exên kiçên wan,

xüfkên wan, jinên wan, ewén sera kenîyeka hosa, di ge I yaré xwei di ge I cîrané xwei binax kirîn, bé ku kes dadgeha wan bikit, bé ku kes li egeran bigert !

Qepqepka wé, hemû hizir şirr kirin, hemû livîn rawestandin, hemû wek peykeran bé gîyan man.

Wek bûka barané, demé biçûk lé kom dibin û li dorén wé direqsin û stranan bi bej na wé dibéjin, tolaz, birbireI li doran kom bûn.

Serinca wé kêfan, çenda mé bû, xwe pitir lé kir. Çenda nazik û şirin bû, xwe kire hingivîn.

Çavén wé yén tijî kil, dilé wan tolazan bi tîrén xwe kunkirin. Wek xwepêşandanê, hemû heIa deré mala wé di gel çon.

Wé şevê, hemû direng çone malén xweI Wé şevê, xew neço çavén kesé. hemû mane hişîyar. Wé şevê, çu dizî li bajérî nehatinekirin.

Wé şevê, kes nema di keI exé pîrej na xwe ne çerî. Wé şevê, çu tolaz neman kaséta mejîyé xwe bi dubarekirinéve hulî nekirî. Kes nema kenîya wé, di ge I dengé qepqepka wé téke I nekirî. Kes nema çavén reş, li bersîngê xwe nenivandîn. Kes nema spédeyé direng ji xew hişîyar nebûy. Kes nema mesîneké ava tezî li ^ê xwe yé xuhday nekirî!

Mizgînîyeka ji bîrkirî

— Tu dizanî, sîlav hatîye e I manîya?

ev gotine di serîda deng veda. Sîlav... Sîlav...

Bawer nekir. Wek hébeIyan beré xwe da hevalé xweI

— Çiye? Rengé te hosa hate guhrîn?

Cihé xwe xweş kir, guhên xweI baş vekirin.

— Te çi got ?

hevalé wî, beré xwe jé da paş, nevîya enîya wî ya giré bibînit.

— Min got, sîlav hatîye e l manîya.

Rast rabû ser pêyan. Nevîya bawer bikit. Hizir kir, eve yarîyeka çivêle ,hevalê wî, demê xwe pê diborînit.

— Bibore kak hej ar, min dil û mejîyê yarîyan nemaîye, bi taybet babetê sîlavê. Tu vê çendê

baş dizanî.

— ez yarîyan nakim. Rojane du sê caran, ez zel amê wê dibînim. Mala wan bi rex malên meveye.

— Yarîyan neke. .. Tu baş dizanî, sîlav bo min çiye. Tu baş dizanî.

— eve te l etona zel amê wêye .heker tu bawer nekî, hilo li ser kîsê min tel etona wî bike.

Te l etona xwe vekir. hej marek lêda, te l eton kire di destîda.

Xwe havête te l etonê.

— Be l ê. Kerem bike .he l o.

Devê wî beş bû. Neşîya bersiva wî bidit. Te l eton berda.

— he l o... he l o.. hevalê wî zanî çi hate serî, te l eton rakir.

— he l o kak Mirad ezim, min divîya pirsa halê te bikim.

— Ge l ek supas... Tu li kîvey? eve du roje tu ne dîyarî?

— ez li mala biraderekê te yê xweştivî bûm, wî jî divêt silavekê li te bikit.

— Li ser çavan, bila kerem bikit, ka ew kîye?

Te l eton kire di destîda û bi kenyeka fêlbazane dûrket.

— he l o, kak Mirad, tu çawanî? hûn çawanin?

— em ge l ek başin. Tu çawanî? Bibore min tu nenîyasî, dîyare ez pîrbûyme i

— Nene? tu heqî. eve demekê dirêje me êkudu nedîtî. ez hewarim.

— Wey li serçavan kak hewar. Bawer bike ,hej ar digot tu li van diray. Min ge l ek caran daxwaza te l etona te jê dikir. Min divîya te bibînim.

— Mala min bo hewe vekirîye. Ê, ê.?

— Kerem bike? bibêje? Te divêt çi bibêjî?

— Supas, tinê min divîya bibêjim ku hûn hemû başin?!

Ser lê wermî. Çavên wî zîq bûn. Ageh ji çu nema. Nezanî çawa te I efon dana. Nezanî çi gotê, nezanî li kûveye i

Sîlav hatîye e I manîya. Cîrana meye i Sê biçûk henei Mêrê wê pûçei bê pareyei bêseruberei —aaaaaxxx sîlav. Bêhna te tijî difina min bû...

Sîlav... Sîlav. Dê li tana te êm. Dê xwe gehînime te i Dê xwe nêzîkî te kim.

— hê, te xêre tu hosa şirr bûy? Wî kabiray çi gote tei

— hei bibore kak hej ar.

— Tu biborei min nizanî navê sîlavê dê te hosa bêhif kit!

— Divêt bi zûtirîn dem, ez sîlavê bibînim.

— Wey serçavan, lê...

— Lê çi?

— Mêrî wê, biçûkên wê.

— Tinê ji dûrvei tinê çavên wê yên reş bibînim, carê besei

— Bi rastî, çavên wê mêrkujin.

— Te çi got?-min got, ser çavan.

Jidîtina êkê

Şev ji nîvîyê borîye i Jor bêdengei tarîye i Xew kabûsekê kirête i Mejî alozei leş westyaye i ..

Li ser milê xwe zivirî, sîlav li ser textê wî rûniştîyei Şeyekê di destîda, pirça xwe şe dikit.

— Sîlav, sîlav. Were bi rex minvei Were ez bo te dîn û harbûm.

— hewar, ez jî bo te sotim. Were min bibei were min rizgar bikei Werei ..

Livîn zêdebû. Gehên nêr harbûn.

— Sîlav, lêvên te çend şîrînin!

— hewar, yên te şîrîntirin.

Xuha le§ê wî zêdebû. Lihêfa xwe pêça nav pêsîra xwe .

— Sîlav, sîlav, axx, sîngê te höşta küvîye.

— Te ez xwarim. Min berde .

— ez ji te têr nabim.

— höşta te çu nedîtîye .

— Ma tiştek ji van hinarên di devê minda xweştir hene?

Leşê xwe yê nazik û spî, li pêş çavan rûs kir. Wek zarvekereka şareza li dor ke I exê wî yê xav hate çepa, hela hêrkirî. Xwe havête ser sîngê wî yê rûs, keline gevizka evînê.

— eve ez bo te Mam. Dê vêca min ji dil bixwe û...

Dengê guhnêlîya wî zêdebû. Livîna wî zêdebû. Şe^ wî di ge I nivînên wî zêdebû.

— Sîlav, sîlav...

Destê jina wî, milê wî hej and.

— hewar, hewar, te xêre ? hilo, navê xwedê bîne?

Rast rabû ser xwe. Li dor xwe zivirî, sîlav nedît. Leşê wî yê ji xuhê terbûy. Destê xwe şor kire pêsîra xwe, zanî yê bûye zava. Qesta se^ûyê kir. Wê şevê xew jê sil bû.

Li beranberî xwedîkê rûnişt. Dêmê wî yê pêtî, salên borî li pêş çavan rêz kirin.

Dengubasên wê tijî bajêrîne .her du tolaz digehine êk, behsê wê dikin. her du pîrej in lêk kom dibin, behsê wê dikin. Ya bûye benîştê hemû devan.

— Kes ji ciwanîya wê têr nabit. Xifşa xezalêye.

— Ne tinê ciwane. dibêjin ge .ek xwandeva û zanaye .

— Pa çawa xwe!î pê werkirin, dane wî golkî?!

— Kes nizanit çawa pê razî bûye.!

— Nivştîyek bo xwe.serê çêkirin. Kî bo min bêjit, eve karê nivştîyane.

— Ne. ne. Çîroka wê ji nivştîyan mezntire!

— Çiye . ! Tu tiştekî dizanî? Dê ka bo me jî bibêje .

— ez bawer dikim bi zorî dayê.

--- ew çawa?!

Bêhina wî teng bû. Pêlên sermayê hi§ên wî komkîrin.Le§ê xwe pêça, qesta jora biçûkên xwe kir.

her sê biçûk, di nav pêlên xewêda berzebûyne. Zivirî jora xwe ya nivîstinê, jina wî, di xewek girandaye.

Li nîva jora rûniftinê, hatuço, heta westîyay. Te I efzyon hel kir, ji vî kenalî bo yê dî. Çu bi dilî nebûn.

hiziran ser ji hemû hestan stand...

— Sîlav...

Wek xezalek küvî, li ser milê xwe zivirî. Tijî navçavan kenî û bişkurîne.

— Tu behsê min dikî?

— erê. Ma tu bawer dikî, ji bilî te. sîlavek dî di dinîyayêda hebit?!

Kenîya wê tijî kolanê bû. Tirsa wî zêde kir. Rengê wî ji şerma zerbû.

— Tu çend bi dilî.

— Û tu çend tirsinokî.

— ev kolane tijî mirovin.

— Ma te dîtîye mirovan mirov xwarîn?!

Bi kenîyek mê, bi rêveçonek hunerî, ber bi wîve hat.

— Kerem bike. te xêret

Tirsa wî gehişte pûstê wî. Reng lê guhart. Paşive zivirî.

— ha ? Çinne. çinne.

Zanî ji mêranîyê xilas bû.

— Te gazî min kir ! Te got sîlav!

— Min? Ne ne. Min tinê divîya... Ê, ê...

— Çiye tu hosa lal bûy ? Te navê min îna. Te çi divêt bibêje. şerim neke?

— Çinne. .. Çinne.

— heker tu bûye mêr û tevîya tiştekî bibêjî. ez dê her livê kolanê êm û çim.

Tijî enîya wî xuh bû. hemû hêza xwe cemand, li rexên xwe zivirî.

— Min divîya bibêjim...

Li ser milê xwe zivirî, li hîvîya peyva wî ma.

— êêê... Kerem bike?

— Min divîya bibêjim... Tu... Tu ge I ek ciwan û şîrînî.

Kenîya wê hemû tuxîb bezandin.

— eve bû? Te ez hinde gîrokirim? Te divîya vê bibêjî?

— erê.

— Supas.

Dengê qepqepka wê guhên wî tijî mozîk kirin.

Li vî bajêrî, kes nemaye ne gotîyê, tu ciwanî, tu şîrînî, te ez sotim, te ez harkirim.

Li hemûyan Mirade bizanin, çawa şû bi vî xwîntehlî kirîye ? hemûyan Mirade bizanin, çawa bi vî hestîgiranî razî bûye?

Nêrgiza ji nûgehiştî

— Jîyê min pazde sal bûn, ez di koka bizav û jîyanêda bûm. Ciwanî, zîrekî, saxlemî...

Dengê wê kiz bû, her wekû bi dest, wek radyoyê, kabika dengî hatîye badan.

— ez li pola sêyê navincî bûm.

Kele ser pişta xwe. Bişkurî^ lêvên wê girtin. Berê wê kele asoyekê bê dawî.

— Min, ew tax û xwandingeh înabûne î§teî§tê. Çu tolaz, li taxé me, nemabûn, min har û dîn nekirbin. Ze I amên bi jin û biçûk, ji ber ciwanî û fêl û findén min, ne dihewyan.Yarên min roj bo rojé zéde dibûn.

Min, yarî bi wan dikirin. Demê xwe pé diborand. hevalên min yén kiç, hesûday bi min dibirin. Bawer bike, kesé ji wan tolazan, neşîya vî dilî dagîr bikit.

Beré xwe da navçavén wî:

— Te ageh ji min heye?

Seré xwe bilind kir, desté xwe havéte pirça wé ya bel av, li ser milén wé rast kir.

— eré, bibéje, min guh li teye,

— Û tu bawer dikî?!

Rast rabû ser xwe, Devé xwe havéte léva wé ya binî û zû berda.

— eré dilé min, ez bawer dikim. Ma kî ji te ciwantir û şîrîntir li vê dinîyayé heye?

Tijî navçavan bişkurîn û hîvî bûn.

— Bibéje i û paşî ?

Cihé xwe xweş kir. Milê xwe, baş, bi milê wî yé rûs ve şidand.

— ez, ji ber tolazan, ne dişîyam derkevim. ez nedşîyam biçime bazarî.

Xwe pitir bi ^ê wîve şidand.

— ew keyf û yarî, li min bûne tirs. ez ge ! ek ditirsîyam. Tirsa min her zéde dibû.

Béy beré xwe bidite navçavén wé. Béy ji cihé xwe bilivit:

— Tu ji çi ditirsîyay ? Ji ké ditirsîyay ?

— Ji bab û birayén xwe,

Xwe diréjkire di ber teniştê da.Sîngé xwe bi sîngé wîve na.Germa ^ê wî, recifka dilé wé kém kir.

— Şevekê...

Cih şirr bû, deng nema. Zanî ew xwenézîkkirine, ji tirseka mezne, Ji nav hizirén xwe derke,. Beré xwe da çavén wé yén tijî kil.

— êê?!

Zanî ya di nav destên dadwerekê adilda.

— Şevekê birayê min yê mezin, ji sükê dihat.

Guhên wî, li devê wê man, ew devê evîn jê dizêt.

— Wê fevê min neşîya xwe ji nav destên cîranê me bînimeder.

Germa lefê wî verevî. Qutana dilê wî zêdebû. hest bi kêmasîyê kir.

— Wê fevê, birayê min ez di koşa cîranê meda girtim.

Di ge I pêlên xweşîyên ramûsana êkê ÇO xwarê.

— Lêvên min di nav lêvên wîda bûn. ez li berperên esmanan difirîm.

Min hest bi pêjina birayê xwe kir. Min hind dît. Pirça min, di nav destên wîdaye. ez bipirçê rakcşam, ber bi malive birim.

Bêy lê bizivirt, her wekû ji wî karî razî:

— Û hevalê te? Çi lê hat? Çi kir?

— Ma dê çi kit?! Revî û ez di nav destên wî zalimîda hêlam.

Dil lê sot. K^şa ber sîngê xwe? Pirça wê davdav bi tilên xwe şekir.Du sê maç li enîya wê dan.

— Bibêje? te dilê min he I and, bibêje?

Çavên xwe neqandin. Axînkek kûr ji hinavên wê derke?:

— Min nevêt ya dî bibêjim.

Destê xwe di nav sîngê wêda gêra, her wekû li tiştekî digert.

— Divêt tu bibêjî. Te soz daye min ku tu hemû tiştan bibêjî, dilê xwe vekî, paşmaykên reş ji bîrbikî. Bibêje ? Da tu tena binivî.

Çavên xwe vekirin, êxistine çavên wî. Zanî rastîyê dibêjit. Zanî, jidil, divêt harî wê bikit.

Piştrast bû, zanî hêşta mirovek heye ? dişêt xemên xwe bo bibêjit. hest kir, bi gotina hemû

nihênîyan dê dilê wê tena bit, dê şêt nivit. hest kir, dilek heye? dê harî dilê wê, xemên wê hilgirt.

Wê jî divîya hemû tiştan bibêjit. Wê jî divîya dilê xwe vala bikit. Wê jî divîya, wan rewşt û tîtalên kirêt, rûs û şermzar bikit. Wê jî divîya berevanîyê ji xwe bikit.

— Spêdeyê zû, birayê min û babê min ji mal derketin. ez hêlame di nav destên birayê biçûk û dayka bê deshe t atda.

— Û xwandingeh?

Bi kenîyek sar:

— ez li hîvîya serbirînê bûm.Tu behsê xwandingehê dikî?! hest bi rûdanek mezin kir.

— Piştî demekê kêm, di ge t hemeyê zêringir û me t ayê taxê me û du ze t amên dî hatine jor...

Rast rabû ser xwet bi dengekê bilind:

— êêê?!

— Ê, ya dî tu baş dizanî.

— Ne net bextê te me ,hemûyê bibêjet

— Ma dê çi bibêjim?! Pirsên te ez hêr kirim.

Destên xwe bi serê xwe venan:

— Bêy min baxêvin,ez li hemeyê zêringir markirim.

— Ne ew bû ewê te digot hindî babê min bû?

— Bawer bike sê jîyên min hebûn. Mûyên serî spî bûbun. Birek biçûkan hebûn û du sê jin berdabûn.

— Wey hewar. hêşta kesên hosa di nav meda mayînet ! Û paşî?

— Min xwe nerazî kir. Xwe asê kir. Kire hewar. Çu guh ne simtin.

Bêhna wê lez kir. Xuh tijî navçavên wê bû. Berê xwe da binê jorê.

— Birayê min yê mezin digot: Te kuştin yan hemeyê zêringir?

Min bi dengê bilind digot: hizar caran kuştin, ne ew pîremêrê hîz û xwedan biçûk û jinên berday.

Dayka min nedihêla çu li min bikin. Ji şerma dinyayê û ji tirsa girtinê.ez hêlame sax.

Dayka min digot: Kiça min, heyamekê şû pê bike, soz bit, ez te jê bidime berdan û te bidime êkê bi nîva dilê te,

hiziran gîyanê her du wan mirand, deng û livîn ji kesê nehat.

— Çiye?! Tu nivîsitî?

Serê xwe hej and, du sê caran destê wê maçî kir. Bêhna wî nehat. Bi hemû hêza xwe, destê xwe li tenişta textî da.

— Çu nemaye ez dê ji xemên teda peqim. ez dê harbim.

— hêşta te guh li çu nebûye. eve êke ji sedê.

Rabû ser xwe, destên xwe havêtine rûyên wê yên ji be? ir ü xwînê:

— hêşta ji vê mazntir bi serê te hatîye?!

— eve li ber hindekên dî çu nîne,

— Ka bibêje hey dilê min, çi ^tên ji vê kirêttir hatîne serê te,

— Binive dê wastî. Binive yan were li bermayîkên mêrên min biçere!

I A. A A A.

Derdê mêrê pûç

Cihê teng, ^ên wan yên rûs pitir pêkve nûsandîne ,hindek caran, pêlên bayekê tezî, ji nav çeqên wan daran, wê xuha ^ê wan zuha dikit.

Wek kevalekê surîyalî, di pişta turmbêlêda, xwe di êk alandîne, Piştî şereevîneka dijwar.

her dûyan alayên spî bilind kirîne,

— Tu nivîstî?

— ez di nav dilê teda he,îyayme,

— Ma ne direnge,

— ji bo çi direnge,

— Demê hatina mêrê teye,

Bi kenîyek sivikve:

— Mêrê min?

— Bibore: Mêrî min û yê te:

Kenîya wê hêza le§ê wî zêde kir.

— We nebêje .ew ji mêratîyê dûre :

— Çiye ? ez hest dikim tu bêumêd bûy ?

— heker ji ber te neba, ez da kime derê.

— Ne .em nihu pêdivî wîne:

Rast rabû serxwe: Dest da cilkên xwe, kirine berxwe: Navçavên wê bûne girê.

— Çi bû? Te guh li dengekî bû?

— Ne: Divêt em bizivirne mal.

— Nihu te tiştek dî digot? Çi bûye? Çi hate bîra te: Min tiştek nedurst got?

— Te ez tore kirim.

— Min? Min çi got? Min çi kir?

— Çune: Ji bîr bike:

— Ne .ez hosa bi sanahî ji bîr nakim û dêmê te yê tore li pêş çavên min. Ka bibêje min çi kir, min çi got, he:a tu hosa reş û tal bûy.

— Te got...

— Ê? Min çi got?

— Te got, em nihu pêdivî Miradin.

— erê. Ma çi têdaye: Ma ne raste:

— Lê...

— Lê çi? ew ya di navbera meda baş dizanit û xwe şir dikit. heker te kire der. Dê me aşkira bikit. em neşên hosa azad di ge : êk derkevin.

— Bes? evebû meremate:

— erê. eve merema mine: Pa ji berçavên wî yên reşe:!

— Te çi hizir dikir?

— Çune. Ma em neçin?

— em naçin, heta tu ne bêjî ka tu çawa di axivtina min gheştî.

— Bextê teda, eve demekê dirêje min ji bîr kirî. Ne îne bîra min.

— Te soz daye min hemû kun ü qolaçên jîyana xwe bo min rohin bikî. Dilê xwe veke .ez hest dikim, ge t ek tişt mayne û te bo min negotîne. Dilê te hêşta hemû neyê mine.

— Min ^ê xwe û gîyanê xwe dayîne te. Bawer bike ,eva min daye te ,her du mêrên min nedîtîye.

— Ne ^şta ge . ek nihênî mayîne. Dilê xwe baş vebike. da tu tenabî, da tu ji qeyda wan rizgar bibî.

— hê hê... ez çi xwe .îyê bi serê xwe werbikim! Ya min dîtî, kes bawer nakit.

— ez dê bawer bikim. Bibêje .

— ez nizanim çawa dest pê bikim? Behsê kê ji wan bikim?

— Behsê her duwan. Lê nihu behsê vî bike.

Bêdeng bû, wek Mamostayeka şareza:

— Te çu caran pirsa xwe nekirîye ?eza bi mêr û biçûk. ez bo çi xwe dikime dibin teve. Te ne gotîye ,ev jine bênamûse. qehbeye. pûçe.

— Ne ne .ez dizanim tu bêxwedanî, bêmêrî. Zulim û zordarî li te hatîye kirin. Te kesê hejî xwe nîne.

— Mala te ava. Lê xe . ik we nabêjit.

— Bila xe . ik serê xwe li dîwaran bidit.

Bêhna wê teng bû. Nîşa^n destbilindkirinê lê dîyar bûn.

— Ê, sîlava min. Bibêje. dilê xwe vebike.

Berê xwe, di pencereya turmbêlêra, da wê daristana xemlandî.

— Berî em bihêne e.manîya, piştî min şû bi Miradî kirî, ez hatme bajêrê hewe.

Bêdeng bû, herweku pe§êman bûy, ew babete vekirî. Destê wê perxand, dana ser sîngê xwe yê rûs.

— ez hatim di nav maleka bîyanîda. hindek mirovên bîyanî. Min hest bi xerîbîyek mezin kir. Ge t ek caran min divîya birevim, bi dinîyayê bikevim.

Du sê rondik ketine ser rûyên wê yên sor.

Destê xwe havête gerdena wê. Bi lêvên xwe ew rondik vemalîn.

— Bibêje t .. Wê qirêjê jidlê xwe vemalet

— Rojekê...

Pişta xwe dayê, nevîya çavên wê, bi çavên wî bikevin. hest bi sîngê wî yê gerim kir.

— Rojekê, ez direng ji xew rabûm. Min dît du kuretolaz, ji jora jintîya min derketin. Rengê wan û seruberê wan dîyarbû ka çi divên û ka çi kirînet Min neşîya xwe bigirim, bi taybet piştî min bi çavên xwe dîtî hindek pare kirîne di paxla xesûya minda, û bûye pistpsta wan. Min guh li xesûya xwe bû, digotê bêhna xwe fireh bikin, hêşta bûke, ma dê kûve biçit? her bo heweye.

— ey hewar eve jî bi serê te hatîye?!

— Û hêşta û hêşta te çu nedîtîye!

— Ka bibêjet zûbe te dilê min peqand.

— Min neşîya xw8t Êvarî Mirad hate mal, min ew suhbet bo kir.

— Ê?

— herwekî min bo dîwarî kirî.

--- çi got? Çi kir?!

— Got, te şol ji kesê nîne .heker ne bi dilê te bit, kes zorîyê li te nakit.

— Tu bi xwedêkî we got?!

— erê û êkser nivîst.

— Û paşî?

— Min hizir kir, dê subehey dayka xwe yan mêrekî kujit yan heker çu nebit, ew suhbet dê mînte di navbera meda. Min nezanî spêdeyê zû ew suhbet hemû gehandîye dayka xwet

— Wey qeda vê bikevin zel amo.

— Dayka wî hate jora met bê ku silav bikit. Li hindav serê min rawestîya û got:

— Çiye tu xwe li ser serê me şerîf diki? Ma em nizanin te çend gan dayîne, berî tu bêye di mala meda?! Da ez bo te bibêjim: Tu rojekê devê xwe vekî, ez dê tijî gû bikim û dê te li nîva cadeyê li ser piftê rabikêfim û çend tolazên vê kolanî, hemûya havême ser tei da baş serê te û malbaba te şor bikim da bo hemû dinîyayê dîyarbit, tu mazntirîn qehbey!

Dengê girîyê, ji axivtinên wê dihat. Bêdeng bû, wastîya, birînên wê yên kevin derbûn, tijî derê wan xwîn bû.

— Ji bîr bike .ez wê malê baş dinîyasim.

— Min ge l ek xwe parast. Min xwe diveşart. Mal wekî cobê lêhatbû. hemû heval bûn, dayk û bab û bira û xûşik. ew bi xwe ,ew jî heval bû.

— Nebêje ez ketim tora wan?

— Xwezî ez bi tinê ketbam tora wan.

Çavên xwe neqandin. Nevîya çavên wî bibînit. Bêhneka kûr hiMşa:

— hevalekê wî, her dihate mala met Ge l ek têkelîya me dikir. Ge l ek caran, em mêvan dikirin, ez nedçom. Min hest dikir ji ber minel Rojekê em daxwaz kirine mala xwel Min jî divîya ji wê girtîxaneyê derbikevim. Vê carê min tif kire pêsîra xwe û tif kire dayk ü babên xwe û bextê xwe yê reş. Min got, heker qehbelî bit, bila bi dilê min bit.

— Û tu çoy?

— Xwezî ez neçobam.

— Bo?

— Piştî xwarnê û çavexwarnê, ez, bi tinê, li pêş te l elzyonê hêlam, ew çone jorên serî.

— Ma bê jin û biçûk bû?

— Jin û biçûkên xwel ji mal birbûne derê, da bi dilê xwe bikevit.

— ê, te çi kir?

— Bêhina min teng bû. Min qesta jorên serî kir.

— Bibêje, tu çi bibêjî ez bawer dikim!

— Min guh li dengê wan bû. Serê min wermî. Min bawer nekir, beta... heta...

— beta çi? Te guh li çi bû? Te çi dît?

— hişbe. Pirsên te ez hörkirim.hişbe .

— Divêt tu bibêjî, da dilê te tena bit. Te çi dît?

— Min çi dît! Tu çi hizir dikî?!

— Jineka dî di koşa mêrê teda bû?

— Xwezî deh jin di koşa mêrê min da ban!

— Dê bibêje. pa te çi dît?

— Mêrê min di koşa hevalê xweda bû!

Gera teye

— Çiye ? eve çend rojin hema tu xwe têr dikî û bêdeng dimînî. Piştî min hemû nihênîyên xwe aşkira kirîn, tu pirsan nakî?

— Ma te negot eve êk ji sedêyet

— Min ge I ek ji nihênîyên jîyana xwe bo te gotin. Te hêşta çu tişt bo min negotîye .evro gera teye . Tu dê xwe bo min rûs bikî.

— Ma ez ne rûsim? Baş berê xwe bide min!

— Min rûsatîya mejîyê te divêt, ya hizirên te. ya jîyana te. Ne ya ^ê te yê pîs.

— Min çu ^tên hejî gotinê nînin.

— Divêt tu jî hemû berperên jîyana xwe bo min rohin bikî.

— Bila. Lê te ge . ek maye tu bo min bibêjî. Ji bîr neke.

— Ma te divêt tu çi bizanî?

— Şeva êkê. Şeva te çawa bû? Tu çawa bûye bûk? Tu çawa kirîye jin?

Xwe havête ser kel exê wî yê rûs û daber leq û mistan.

— Tu ze l amekê hîzî... Ji çu têr nabî.

— Dîyare şeveka ge l ek xweş bû?!

— Ya mêrê êkê yan mêrê duyê?

— Ya mêrê êkê.

enîya wê bû girê. Di nav hiziranda berzebû. Xwe kire qurmik. Tirs nêzîkî dilê wê bû.

— Çu caran naête ji bîrkirin. Jîyana min hemû guhart.

— Wey babû. Dê ka bibêje, çi hate bîra te hosa rengê te hate guhorîn?

— erê, te divêt ez bibêjim da tu destperyê li ber bikî.

Kenîya wî ji dil derket. Cih tijî jîyan kir.

— Ma dê çawa destperyê bikim û ev ciwanîye li ber sîngê min?!

— Pa te çi merem pê heye ?eve deh caran te ev daxwaze ji min kir?

— ez bawer nakim, wî pîremêrî şîyabit, wê şevê, vê kara xezala pazde salî bikite jin?!

Kûr di nav hizirên xweda ço xwar. Hemeyê zêringir, li ber sîngê wê, doxwîna xwe vedikir, divîya birevit. Pişta wê bi sîngê wîve ma. Sîngê wî yê gerim zivirande ser hişên wê.

— Te rast got, wê şevê ez bi sanahî nebûme jin. Lê soz bit ez ne bibêjim heta tu şeva zavatîya xwe bo min nebêjî.

— Wey ser çavan. Dê bawerbikî heker min got?

— heker te rast got, ez dê bawerbikim.

— Ma tu çawa dizanî min rast got yan net

— Rengê te, çavên te, neşên direwan veşêrin.

— Wesa? Tu bawerdikî, ez ji dil hez ji te dikim?!

— Nexêr. Tu hez ji min nakî. em timamkerên êkin. ewa ji te kêm, ez didime te ,ewa min divêt tu didîye min. Lewma em dişên pêkive bijîn!

— Ne ne, bawerbike min tu jidil divêy.

— Çavên te we nabêjin. Ji suhbeta me nereve,

— Te çi divêt bizanî?

— ewa te ji min divêt bizanî.

— Çîroka min, ge I ek ji ya te cudaye.

— Dibit, lê ew tiftê we li te kirî, tu jin û biçûkên xwe ji bîr bikî û bi dû min bikevî.

— Ciwanîya tei çavên tei kenîya tei ..

— Direwan nekei Jina tei ge I ek ji min ciwan û şirîntire .ez bawer nakim çi jin çi mêr, heker li mala xwe têr bin, qesta cihekê dî bikin. Vêca bibêje ka egerên te çinei Û ji şeva zavatîya xwe dest pê bikei

— Çiye? Te jî divêt destperyê li ber şeva min bikî?

— Bo ne !?heker şeveka xweş bit, ez amade mei Da ber sîngê xwe.

— ez hîzim yan tu?

— Xwe mijûl nekei

— Çi bo te bibêjim? Çi ji te veşêrim?

— Çi veneşêreı Wekî min, xwe rûs bikei

— hê hê. ez şerim dikim çîroka xwe bibêjim.

— Ma ji ya min xirabtire?

— Nei Lê bo êkî wek min, şermzarîyei

— Dê ka bibêjei te çi qiphei kirînei

Wekû pîremêrekê danemir, bo nevîyên xwe çîrokekê bibêjit, cihê xwe xweş kir.

— her ji roja bûna wê...

— Ê?

— Mala me di gel mala Mamê min pêkhatin ku bidine min.

— hêşta ev tişte li vî zemanî maye ?!

— erê, bo rûreşîya min, hêşta mayei

— Tu çawa razîbûy?

— ez biçûk bûm, min çu nedizanî.

— Û piştî hûn mezin bûyîn?

— em pêkve mezin bûn. Pêkve xwandin û pêkve jîyan. Roj bo rojê li pêş çavên min reş bû. her çende wek te gotî, ciwan û şirîn û xwandeva...

— Bila hewe birîyara xwe daba, piştî hûn mezin bûyîn.

— Babê wê zû mir, di nav mala meda ma. Babê min soz dabû birayê xwe. Neşîya lève bibit. Min jî nevîya dilê wî bhêlim.

— Te dilê xwe he I and, da dilê wî nehêlî?

— erê erê. Min xwe û ew gorî axivtineka berî bîst salan kir.

— Û wê? Serederîya wê çi bû?

— Wê ji dil hez ji min dikir. Lê...

— Lê çi?

— Piştî min rastî bo gotî, dilê wê jî çirmisî.

— Pa hûn çawa di ge I êk dijîn? Jîyana hewe çawa diçite serî?

--- piştî biçûka, me çu pê çê nabit. Wek tu dibînî, nîveka demê xwe ez di ge I te diborînim.

— Û ew? ew demê xwe çawa diborînit?

— Biçûk û karubarên malê, xemên wê sist dikin.

— Tu bibêjî jin bi van tiştan bi tinê dijît?

— ez mafê wê li ser xwe nahêlim.

— ez bawer dikim tu merema min dizanî û tu baş mafê jinê dizanî!

— Wek min gotîye te ,ez mafê wê ji bîr nakim.

Çavên her duwan, bi banê jorêve. man hilawîstî. hiziran ji nav çar dîwaran birine der.

Dengê deheol ü zirnayê, tijî guhên wî bûn. Tilîlîyên kiçan, govend şarand. Li ber sîngê wî dû sê tolazan xwe dihilavêt. Di dura, jin û kiçên xemlandî bi lewendîyên sor û zer, diketine çepan.

Destê birazavay, li ser milê wî yê rastê yet Babê wî li rexê çepê devê wî beşet Birazavay, kitkte mêvan verevandin. Ce vala bû. Deng kêm bûn. Ronahî vemirandin.

Li ber dergehê jora wî, devê xwe bire bin guhî.

— Tu dizanî dê çi kî?

Serê xwe het and. Şerim ji navçavan dibarî.

— Şerim neke .ew he t ala teye t Pitir şermê rûyên wî sorkirin.

— Dê careka dî bo te bibêjim. heker tu tengav bûy, gazî min bike .ez dê li pişta derî li hîvîya te bim.

Xwe kire qurmik. Şerim tijî nav pûstê wî bû.

— Bibêje ê... Dê bi pê rastê çîye jor. Dê navê xwedê înî. Ge t ek li nik ne rûnet Dê xwe rûs bikî. Çu tiştan di ber xwe nahêlî. ew jî divêt xwe rûs bikit. Dê kevte ser pişt^ her du pêyên wê jêkive biket Navê xwedê bînet Bi hemû hêza xwe bikêşe ber sîngê xwe . ..

Te zanî yan dîsa bibêjim?

— Min zanî, min zanî.

Derghe vekir. Palek pêrana, havête di jorvet Berî silav bikite dotmama xwet Pêsîra xwe ter kirbû.

hest bi nêratîya wî kir. Ji nav hizirên wê hişîyar kir.

— Çiyet Te xêre hosa bêdeng bûy?

— hat Çune çune .ez dûr çobûm.

— Dîyare ji wê xencera ha ha dê tenişta min kun kit. Givaşte bersîngê xwet

— Nerevet Dê her bibêjî ka te şeva zavatîya xwe çi kirîyet

Xwe havête ser sîngê wê yê rûs. Devê xwe havête lêvên wê yên ter. — iha min ho kir.

Kenîya wan jor tijî bizav û jîyan kir.

Ber bi xerîbîyek dî

— her ji heyva êkê, ez hatîme di wê malêda, min hest bi xerîbîyeka dijwar dikir. hemû tişt bo min dixerîb bûn.

Mêrê min, di ser bêdesthe I atîya wîra, wek dojminê min bû. Xesûya min, wek polîseka bêdil serederî di gel min dikir. Birayên wî, xûşkên wî, li hîvîya ketina min bûn.

hemûyan divîyan ez xwe bi erzanî bifiroşim. ez xwe bi pîstê wan bigihorim.

ez kirasê wan bikime berxwet

Rabû ser xwet di nav wî gîyayê li ber lêva rêya di nav daristanêra diçit, li kulîlkekê gerîya. Kulîlik bilindkire ber difina xwet

— Min ge I ek berevanî ji xwe kir. Min ge I ek xwe asê kir. Min ge I ek xwe ragirt. ez wastîyam. ez bêhêz bûm.

Binemala mêrê min cobexaneye .eve hemû bo min nexem bû. Xema mina giran, xema pişta min şkandî, mêrê min qûndeh bit. Mêrê min, her roj di bin hevalekê xweda bit.

Bi rastî eve ji hêza min mezntire .ez neşîyam xwe li ber bigirim.

ew kulîlka didestîda, kire diberûka wîda û dûrket.

— Rojekê min birîyar da, xwe bidime berdanê. Min ji dil, kar bo berdana xwe kir. Min gote Mirad, divêt tu min ber bidî.

Bêdeng bû. Li xwe zivirî, hest bi harîkarîya wî kir.

— Birayê minê mezin, di hewara min hat. Min got, mala xwedê ava, hêşta ez bi xwedanim. Dê min ji vî kirasê pîs înte der.

Serê xwe şor kir, nevîya berdewam bit. hest bi şermê kir.

— Bibêje dilê min. Wesa dîyare, kesê hejî nîne tu nihênîyên wî ve§êrî. Dilê xwe ji qirêja wan paqij bike.

Berê xwe da navçavên wî, zanî vê çarê direwa lê nakit. Zanî wî jî ji dil divêt dilê wê ji xeman vala bikit, ji qeyd û zincîrên her du mêran azad bikit.

— Çi bibêjim? Dilê min. Çi ve§êrim? Min çîroka xwe û ya mala xesûya xwe du sê carî bo birayê xwe got. Li destpêkê dest da demanceya xwe. Min got dê evro du sê kesan ji mala mêrê min kite kel ex.

— Ê? Paşî çi kir?

— Piştî xesûya min hatîye mal. Birayê min da bersîngê xwe û da ber maçan, bi germî bi xêrhatina wî kir. Bire di joreka dîve .ez nizanim çi bo got. ez nizanim çi pêve xwand.

Lê ya ez baş dizanim, wê şevê heta spêdeyê du jin li mala xesûya min, di ber tenişta birayê minda nivîstin!

— ey hewar... ev kare di nav mejîda henet!

— erê, bawer bike, min bi çavên xwe dît.

— Û birayê te çawa razîbû?!

— ew jî nêre. Wek her nêrekî!

— Ê, ê? Bibêje te ez hêrkirim.

— Spêdeyê birayê min hate nik min û got:

Ji evro pêve, tu bi xirabî behsê vê malê bikî, ez dê te bi vê demancê bikujim. Netirse ,ez te xafil nakim. Dê her çend rojekan ême seredana te.

Destê xwe dana ser milê min û got, guhê xwe bide mêrî xwe.

Bi kenî û tilîlîve ,heta dergehê ji derve hemû di ge I çon.

ew kaxeza ez pê dixwerîm, min ji dest da. ez Mam di nîva wanda hilawîstî.

Kes nema ez pê bixwerim. Kes nema ez penayê bibimê. her çend rojekan, birayê min û hevalên xwe, dibûne mêvanên me.

Girî, ji dil girîya. Dengê nesaxekê bêomêd ji girîya wê dihat.

— Min hemû tişt ji dest dan. Xwandin, paşeroj, tu çîroka mêrê min dizanî. Birayê min te

nîyasî. ez Mam bêxwedan. ez ditirsîyam. Ji dil tirsîyam bikevme tora wan. Bikevme bin

pêyên wan. Bibime qehpe. Bi şev, ez nedinivîstim, ji tirsa êk bi zorî bête di jora minda. Bi

roj, min dergehê xwe digrt, kilîl dida. Xwarin û vexwarina min bi dizî bû. Destav û hatinuçona min bi dizî bû.

Dengê wê, awazên wastîyan û bêhêzîyê jê dihat.

— Berxwedana min sist bû. Min neşîya berevanîyê ji xwe bikim. Jîyana min di ge I wan wek şe^ man ü nemanê bû. Min xwe diparast. Wan jî berevanî ji jîyana xwe dikir. Wan hest dikir, ez dê hêlîna wan ya ava û nihênîyên wan têkdim. Min jî hest dikir, berdewamîya jîyanê di ge I wan, dê min tûşî êşa wan bikit.

Çu ji min naêt. Bira û xweşn^^ min, di koşa jintîyên minda dinivit. Berdan nema. Kes min narevînit, ji bo azadkirina min. Xwekujtin, bi dest min nakevit.

Çend carekê min gazinde bo birayê xwe dikir, li min dixwerî û digot:

— Ma dê her roj bi berdana te ve bim. Duhî bû, te xwe ji mêrekî dayîye berdan. Vê suhbetê

nekî, başet

Ge I ek şevan heta spêdeyê ez dimam hişîyar. Ge I ek rojan, min xwarin nedidît. Tinê hizir dikirin. Tinê li rêyekê digerîyam, ka çi bikim? Çawa xwe ji vî halî rizgar bikim? Çawa xwe biparêzim? Gel ek caran, min hizir dikir, çawa xwe bikujim?

ev zivroket demekê dirêj di ge I min ma. heta rojekê, ez li ser banî bûm, min xwe ji mêvana vedişart.

Kurê cîranê meI yê zirtolaz, hate hindav serê min, ez ge I ek jê tirsîyam. Wî bi kenîyeka ciwan û sade got:

— NeIirse .ez çu li te nakim.

Min xwe vekêşa û berê xwe dayê ka dê çi bikit.

Wî suhbet vekir û got:

— ez baş dizanim tu di deravekê tengday. ev mala tu hatîyê, maleka bênamûs û bêşeretin. Wesa dîyare tu kiçeka başî.

ez pitir tirsîyam. Min pitir hest bi şerekê nihênî kir. Bo min dîyarbû, xeI kê vî bajêrî hemû dizanin ka çi li vê malê rû didit.

Rûnişte ser bilokekî, berê xwe da navçavên min:

— heker tu di nav wanda bimînî, êfa wan, dê te jî girt.

ev gotine wek zengekê di serê minda deng vedda.

Min hest bi tenahîyê kir:

— Ma çi ji min dêt? ez ne§êm çu bikim?

— Bireve .here, ji dervey we I atî!

Tijî navçavên min hîvî bûn.

— Çawa?! Ji derveyî we I atî?

— erê. heker te bivêt, ez dê te derbaz bikim. em dê pêkve çine derê dê... ez lê xwerîm:

— Dîyare te jî wek wan meremek heye? Yan wan tu hinartî? Dê here dûr bikeve , hej arî paşive ço û got:

— Tinê merema min, ev ciwanîye ne ête firotin.

Min qesta jora xwe kir. Dengê wî, di serê minda ma. here ji derve, .. Bireve, .. Ji dervey welatî...

Min ew gotin, kirine birîyar. ev birîyare ,ev pêngave? dê min ji xwekujtinê rizgar bikit, ji berku ez çu car hizira xwe? irotinê nakim. Berdan jî nema, tinê li pêşîya min, xwekujtine yan ev birîyareye .ez dişêm li dervey we I atî, li ser Miradî zal bibim, ez dişêm biguhorim. Li wê derê, hindek ^tên baş bikim, dê şêm kime mirov, kime mêr.

Bêdeng bû, wastîya, li ber tenişta darekê rawestîya. hiziran bilind kire berperên esmanan,

hizir jorda hatine xwarê. Demê ji piştve kirîye di koşa xweda. hişik, pişta wê, bi sîngê xweve

şidand. her destekê xwe havête memkekê wê. Devê xwe di nav pirça wêra havête binguharên wê.

hest bi tenahyeka bêdawî kir. Nevîya ji wê xewnê hişîyar bit. Nevîya dem bilivit. Nevîya ew şidandina bi sîngê wîve sist bibit. Ji dil divîya di ge I ^ê wî yê gerim, bibite êk parçe, Bibite êk leş û êk gîyan.

— Soz bit, ji evro pêve ,ez nehêlim tu çu nexweşîyan bibînî.

— Nihu, dilê min ne bi min veye. Dilê min yê bi jina teve. Te ew bo xatira min hêla, da xemên min sist bikî.

— Xema wê nexwe .ez wê, bi tinê, nahêlim. Dê xemên hewe herdûyan sist bikim.

Kenîya wê, hindek çûçik ji bin wan daran revandin.

Li dor xwe zivirî. Sîngê xwe bi sîngê wîve na.

— Te ez kirîme êxsîra xwe.

— Tu nîveka jîyana minî.

— Û nîva dî, jina teye mane?

— Bi bore . Ne tinê ew jina mine ,ew dotmama mine jî, dayka sê biçûkên mine jî.

— ez jî razî nabim, tu wê bêxwedan bihêlî. Pitir xwe bi sîngîve şidand.

— Tinê min divêt tu bizanî, ez ji dil pêdivî teme.

Revîn ji rastîyê

— ez di ziviroka xemên xweda hêrbûbûm. Dinîya li pêş çavên min tarî bûbû. Min, heval ji bîrkirin. Min, kar nema. ez ke?me beranberî rastîyeka tal.

ez berdewambûn û danpêdan bi jin û jîyana bo min hatîye helbijartin, yan pê li hemû rewşt

û tîtalên bab ü kalan danim. Jina xwe, dotmama xwe, dayka biçûkê xwe yê di zikê daykê da,

roj bo rojê mezin dibit. Bi sê te I aqan berbidim. Û bab ü dayka xwe bi wan sê te I aqan binax bikim ?!

Min ge I ek xwe ragirt. Min ge I ek xwe asê kir. Ge I ek şevan, hela spêdeyê, ez nedinivîstim.

Ge I ek şevan, min hizira jinekê dikir. Ge I ek caran, li ber filmekê bîyanî, min vedresand. Û ew şengejna ciwan û nazik, li ber tenişta min ya nîv rûs bû.

ez gehiştim pileya xwekujtinê. BiboreI li we I atê meI tinê jin xwe dikujin. Babê min, dayka min, kesukarên min, neşîyan êşa min bizanin. Min nedişîya derdê xwe bo kesê bibêjim.

ez di nav xweda diheIîyam. ez ne evîndarbûm. Ne neI Min çu yar nebûn. Min hez ji çu kiçan nedikir.

Tinê min divîya, ewa bête ber dilê min, bi rêya evînê bêt. Bi rê û bi birîyara min û wê bit,

ne bi birîyara babê min bit. Min divîya, ez û ew pêkve pilanan danin. Pêkve ji bo paşeroja

xwe xebatê bikin. em pêkve cilkên bûk û zavanîya xwe jî bikirin. Pêkve navmalî û textê nivîstinê bikirin.

Êvarîyekê, ez zivirîme mal. Piştî ku çend rojekan, ez bi karekî çobûme hewlêrê. Min dît, mala me serubin bûye. Kes wek xwe nemaye. Çu tişt li cihê xwe nemayne.

her li derî, dayka min û xû^kên min, bi dehwat û tilîlî hatine pêşîya min. Birayên min, êk êke hatine serê min.

Berî ez rûnim û çu pirsan bikim, babê min gote birayê min, here wek min gotî û zû bizivire.

Birayê min, xwe ji ber tenişta min havête derê û qesta wî karî kir, ewê bo min, hêşta nedîyar.

Min çend caran vîya pirsê bikim, du sê pirs ji min hatine kirin û bersiva hindek pirsên dî hate dan. her ez mijûl dikirim.

heta me I a di ge I sê çar ze I amekan dayn jor, hemû tişt bo min xûya bûn!

Bêhna xwe kûr hiMşa. Serê xwe bilin dikir. Stêrka çavên xwe êxste hindek ewran.

— Roj bo rojê ew hej ar li ber dilê min sar bû, reş bû. Min nedvîya bibînim.

Spêdeyê, ez diçome karî. Nîvşev dizivirîm mal. heta ew nenivîstiba, ez nedinivîstim. Ge I ek şeva, bi tinê di jora rûnişti^da dinivîstim. Ge I ek caran, li nik hevalan dinivîstim.

eve hemû nebû çare. Çare, dê dilê ge I ekan tijî xwîn kit. Dê ge I ek pirs ji bin ezmanê xwedana derkevin.

Min xwe gorî wê kir. Dibit, wê jî, xwe gorî min kirbit. Dibit hîvîyên wê, ji yên min mazntir bin.

Min neşîya xwe pitir li ber bigirim. Min birîyar da birevim, derkevim, xwe veşêrim.

— BiboreI û ew çawa gehişte tet Bêhna xwe vekir. Serê xwe şorkir.

— Çîrok dirêjeI

Wek tolvekirinekê, didilê xweda digot, te ge I ek caran gotîye min:

— Bibêje I Ma me çi heyet Ma çi li hîvîya meyet Bibêje I

Berê xwe da navçavên wê, hesta serkevtinê li nik dît. Wê jî divîya hindek hebin wek wê tûşî nexweşîyan bûbin. Wê jî divîya mayê xwe di hemû xweşî û nexwe§îyên wî bikit.

— Rojekê, hêfta tu bûk bûy...

— Çi? ez?

— erê, ew çend rojek bûn, tu hatibûy hifkebajêrê me.

--- ê ê?

— Tu di gel xûşka Mirad hatbûy sûkê. Te ew bajêr û sûk înabûne îşteîşte.

Kenîya wê awazên herzekarîyê jê dihatin. Lê zû xeman dêmê wê girt.

— ez hêfta bi omêd bûm. hêfta min çu nedzanî. ez ji girtîxaneyê rizgar bûbûm.

Berê xwe da navçavên wî.

— Neku ez hingê kelbûme dilê tel!

— Demê te ew kenîya har li wê sûka nêr berday.

— hey gawir. eve çend sale te bûseya xwe li ber min veday. Tu ranewestîyay, hela ez kelîme davên te. hela te ez êxsîr kirîm.

Xwe havête ber sîngê wî ü givaşt.

— Li bîra teye. demê cara êkê min navê te înay?

— Ne. Ne li bîra mine. Ka bibêje çawabû ?!

— Navê te ke.ibû ser zarê hemû tolazan. Bûbû benîftê hemû devan.

— Wey hewar! Ma ez çi bûm?

— Tu ciwantirîn û şirîntirîn û naziktirîn û...

— Bese bese .ez dê bawer kim.

— Bawer bike. Te ew bajêr mê kiribû.

— Ê? Ka bibêje çawa cara êkê me êkudu axavit?

— Min neşîya xwe, min gazî te kir.

— Û başî?

— Te got. Keremke? Te xêre?

Berê xwe da navçavên wî, zanî rastîyê dibêjit.

— ez ji şerman hişik bûm.

— Ê?

— Çu axivtin ji min nehat. Rengê min zer bû. Te her digot te xêr bû, te navê min înay.

Min ji şerma got, çune çune.

— ev rûdane. ne li bîra mine.

— Te got, heker tu bûye mêr û te zanî dê çi bêjîye min.ez her di van kolanara diêm û diçim.

— Wey tu bi xwedêkî?! Min we got?

— erê. ew xwîna mayîye di ^ê min, te ew jî hişik kir.

— Bibore dilê min. Min nezanî xwîna te hinde şirîne.

— Min jî xwe kire mêr û gote te:

Tu ge : ek ciwanî. Tu ge . ek şirînî...

— Û te ji dil digot?

— erê ji nîva dilî.

— Û min çi bersiv da?

— Kenîya te ew bajêr li tana min îna. Çavên hemûyan li devê te ma.

— ez nemînim. Neku min dilê te hêla bit?!

— Ne ne. te hema dil bo min nehêla.Te bi sarîve got,eve bû te ez mehtil kirîm?Te divîya vê bibêjî?

Çeqçeqa şimka te ,ew kolan kire gorstan.

— ê ? Û paşî?

— ez li hîvîya te Mam, ka dê kengî dîsan êy.

— ez roja dî hatim. Mane?

— Dîtina te bû ew car. Tu li min berzebûy. Çend hewil min dan. Çend pirs min kirin. Min neşîya te bibînim.

— ecêbe tu jî wek ge I ek tolazan nedihatîye mala xesuwa min?!

— ez hatim. Bibore ,ez ji ber te hatim, ne ji ber pûçatîyan. Ji ber dîtina tei

— Çi digotine te?

— Digotin, ne li male? nesaxe .her car hêcelek digirtin.

— Kesê nedgot, te çi jê divêt?

— Kesê ageh ji kesê nebû. hindek pare difên mirovî bikine ker!

— Bibore? Te çîroka min zanî. ez ji kuna xanî dernedikelim.

— Xwezî min ageh ji te heba.

— Da çi kî?

— Da te revînim.

— Bibore min xemên te zêde kirbûn.

— ez dîn û har bûbum. ez li çu cihan ranedwestîyam.

Berê wê kele navçavên wî. Wêneyê xwe di çavên wî yên zîqra didît.

— hela rojekê min guh lêbûy. Gotin, Mirad û biçûkên xwe çoyne ji dervey we I atî.

— her wekû ez wê rojê ji dayk bûym.

— Min jî her wê rojê pasportek kirî û karê xwe kir. Piştî deh pazde rojekan, ez gehiştim el manîya.

— Jin û biçûkên te?

— ez ji ber wan revîbûm. Te divîya di ge I xwe bînim!

— Pa çawa hatin?

— Piştî salekê ez li te gerîyam. Tu berzebûy. ez ji te bêhîvî bûm.

Rojekê babê min tel elon kir û got, jina te û kurê te dê piştî du rojên dî gehne nik te?

— Wesa bi sanahî?

— Pareyekê mezin lê xeric kirbû. Vîza §ênkîl bo wergirtibû. Bi sanahî gehiştine dev min.

— evjî hatîye serê te?

— hêdî hêdî, min şîya xwe nêzîkî wê bikim. Bi taybe? piştî kurek peyda bûy. Dilê min ge I ek pê disot. Min tu ji bîrkirî, dest bi jîyana xwe kir.

— Daxwaza lêborînê dikim. Min tu dîsan tûş kirî.

— hela hej arê malmîrat hatî û ew mizgînî gehandîye min. ez careka dî tûşî nexweşîya vîna te bûym.

— Bibore? min ageh ji te nebû. Tu bûbûye sîkotîn û ji min venedibûy.

— heker bi min bit. Dê xwe kime ristik û berdime nav van memkan, iha li vê derê. ezmanê xwe di nîva memkên wê yên rûs gêran.

— Be I a xwe ji min vebike .ez hest dikim, ez egerê malxirabkirina te me?

— erê. Çavên te egerin.

— Ne ne ,ez ji dil dibêjim. Min nevêt çu malan wêran bikim.

— Mal wêrankirina çi? Te ageh ji min nebû. ez eve çend sale li te digerim.

— Li destpêkê, demê tu dihatîye mala me? min ge I ek pê nexweş bû. Min hest dikir, tu ji ber Miradî diêy wek ge I ekan. Car jî min ji çavên te û awrîyên te bawrdikir. Min digot, ne ne ji ber min diêt. Wî ez divêm.

— Ji ber Miradî? Ma ez ciwanîya te nabînim hela bi dû nêrekî bikevim?!

— hindek mêr li mêran digerin. Me eve jî bi çavên xwe dît, hêşta em nemirîn.

— Û paşî çawa dilê te bi minive ma?

— Piştî wê şeva tu li mala me nivîstî û spêdeyê ez û tu bi tinê mayn û te qesta min kirî, ez ge I ek ji te tirsîyam, ez ge I ek ji te torebûm. Dilê min ji te sar bû. Min got, evê rweşenbîr û axivtin xweş. ewê min hizireka mezin bo dikir. ew jî êxsîrê binê xweye .ew jî nêreI Lê piştî te gotî, neIirse ,ez çu karên ne bi dilê te nakim. ez nehatîmeI te bitirsînim. ez hatîme harî te bikim û te xwe aqil kir û tu çoîye di jora xweveI Min zanî tu ne yê xirabyêy. Dilê min tena bû, min hest kir, êk heye divêt harî min bikit û başî te I eIonên te ez hêr kirim. SuhbeIên te ez har kirim. heIa te ez gehandîme xwe .hey gawrê bê dîn.

— ez gawrim yan tu?

— Tu ne bes gawirî, tu gawir û direwînî.

— Direwîn?!

— erê û mezntirîn direwîn.

— Dibit ez gawir bim, lê ez qet direwan nakim.

— Te direweka hindî dinîyayê kirîye t Te gote min, hişîyar be ,ez û tu nemînine bi tinê. heker ez dê te dime ber leqan û xwem.

Xwe havête ser ket exê wê û da ber leqan. Dengê wan, yarîyên wan, hemû tuxîb bezandin.

Bk JB A A A ■ A

Mêrê êkê

Hemey zêringir

Dergehê turmbêlê ve kir, xwe havête der. Qesta nav wê darstana tarî kir. her wekû li tiştekî berze digerit.

Pişta xwe dayê. Destên xwe di bin ketşên xwera birin. Memkên xwe di navda veşartin. Da kes jêvenekit!

— eve te ge t ek caran, ev pirse ji min kir. Niza te çi merem pê heyet

Wî jî xwe ji turmbêlê havête der. Li pişt rawestîya, destên xwe havêtine navtenga wê, pişta wê bi sîngê xweve şidand.

— Tinê min divêt bizanim, ka wî pîremêrê bîs, çawa ev şêrej ine kire bûk? ez qet bawernakim, bisanaey te xwe bi destve berdabit!

— ez her dibêjim. Tu ze t amekê hîzî, ji çu têr nabî!

— Piştî du mêr û sê biçûkan, ez neşêm te razî bikim. Çawa wî xwetîserî tu razî kirî?!

Kenîya wê bet gên daran hej andin û her zû bû xem.

— heker tu bizanî wê şevê çi hatîye serê min, heker tu rastîyê bizanî, dê bo min kîye girî, yan dê wî pîreseyî dîye ber demanceyan!

— ez ji te venabim, heta tu rastîyê nebêjî.

Li xwe zivirî. Kete beranberî çavên wî yên nêratî jê dibarit.

Wek xwandina raportekê dest pê kir:

— Hemey zêringir, mirovekê ge I ek zengîn ü xwedan mirove. Ji ber zikê wî yê mezin, bej na wî kurt dîyare. Mirov di§êt mûyên serê wî bihjmêrt. Du çavên biloq di serîda wek çavên beqa xûya dikin. Ji difina wî ya mezin xûyaye. ku mirovekê nêrekere. Lêvên wî her dem bêhna kebaban jê diêt.

Sê çar jin berdayne. bireka biçûkan hene . Jîyana wî, dinîya wî, tinê zik û binzkên wîye .

her jina ciwan, her kiça ciwan ço di dikana wî ya zêrîve û kete dilê wî, ew amadeye. malê xwe hemûyê bikite di pêsîra wêda.

Du Sê gaveka ço paş.

— ez nizanim çawa ez dîtibûm?!

Berûkên birayê min tijîkirin. Babê min razî kir. Li ser bextê minê reş, ewê şevê birayê min, ez di ge ! cîranê me dîtim, hêce.a wan xweş bû.

Divîya bêhna xwe vedit.

— ewa dî tu dizanî.

— ez ya giring nizanim.

Kenîya wê, dengê sêwîyan jê dihat.

— Tu rijdî tu bizanî?

— Ya mirin yan zanîn!

Pişta xwe dayê, berê wê ke.e bej na dareka bilind. hizira gîyanê wê ji wî cihî bilind kire ber esmanan, dûr ke. wek peykerekî xûya dikir.

Bej na xweya bilind, bi xemla bûkanîyê di joreka sarda dît. Di ge . kêmbûna dengê dewatîyan, qutana dilê wê zêde bû. Ce şir bû, ronahî kizbûn.

Wek bîve. erzê, pênek li dergehî da. Qesta wê mêkewa hêşta ferx, kir. Bêy silav û destûrdan, çinglê wê girt, havête ser textî. Cilkên wê diberda dirandin. Wek gurgekê har û pirsî, ke.e ser ke . exê wê. Da ber leqan, da ber maçan, alîst, givaşt, perxand, têkveda...

Li ser piştê, li ser zikî, li ser teniştê, wek bûkeka patey, di nav destên biçûkekê şûmda çu nema lê nekirî.

ew gurgê har, li ser wî kel exê nazik bû jin. Nêratîya wî bû pate. Çav lê şorbûn. Nemêr bû.

Çu jê nehat. Rabû serxwe. li nîva jorê çend carekan bi wî zikê mezin û wî kel exê rûsê pîs hat û ço. Ge l ek caran, ew le§ê spî û nazik, alîst. Ge l ek caran bi wan dest û tilên zivir, ew gerden û ew hêkên kewan perxandin. Çu jê nehat. Neşîya çu bikit.

Dengê kuxka birazavay, xwîna dilê wî dibezand. Bi wê rûsatîyêve. dergeh vekir.

— Kes li van diran nemînit. em dê spêdeyê êk bibînin.

Tirsa wê zêde bû, kes li dora nema. Kes li tana wê naêt. Bi tinê di nav destên vî gurgê pîrda ma.

Baş dergeh girt. Careka dî li dor teni§tên wê hate çepan.

Careka dî, li dor bej na zirav û pirça reş û çavên tijî kil û rondik zivirî.

— hey kiça seyî... ez rojê du sêyekên wekî te. di paşîya dikana xweda digêm. eve te çi li min kirîye? Çi li min hatîye?

hest bi serkelinê kir. ew tirs, ew dirindatîya wî, li pêş çavan sist bû. Zanî neşêt çu bikit. Zanî çu pê çênabit. Zanî, dê bite pêtirankê hevalan. Dê bite pêlava wê. Zanî dê hizar hîvîyan jê bikit, hela harî bikit, hela ji vî deravî rizgar bikit.

Pitir xwe li ser textî tena kir, bi çavên tijî tirs, berê xwe dida zikê wî yê mezin. Di binda du gunên şor û pirteka goştê mirî dihejîyan.

Divîya pê bikenit, divîya yarîyan bi gunên wî bikit. Lê hêşta tirs li ser zal bû.

Çavên wî, bi çavên wê yên reş ket in. Zanî bûye pêtiranik. hest bi kêmasîyê kir. Zanî yarîyan bi gunên wî dikit. Zanî bi zikê wî dikenit. Mêranîyê xwe li serî da, bi her du destan simbêlên xwe badan. Serê xwe bilind kir, pencere baş kirtin, perde berdan, jor tarî kir, li hindav serî rawestîya.

— Tu dizanî ez ji vê jorê nacime der, hela te nekme jin, hela te ne gêm, hela vî parça patê li bin te tijî xwîn nekim! Tu vê çendê dizanî yan nel

Berê xwe jê wergêra. Zanî çu jê naêt, zanî kelîye lepên xwel Pitir xwe di nav lihêfa xweda kire qurmik.

— harî min bikel Da ez û tu ji vê ezabê derkevin. harî min bikel da ez ji vê şermza^ rizgar bibim.

hest bi serkelinê kir. Pişta xwe dayê. herwekû qebê wî dixwast.

— ez dernakevim, heta nebme zava, evê baş bizane .ez dê çi bêjime hevalan?! ez ne ji nû tolazim! Tu ne kiça êkêy ez dikime jin.

Divîya hîvîyan jê bikit. Rû nedayê. Nedşîya berê xwe bidite binzikê wî yê mirî.

Li nîva jorê hat û ço, ge t ek caran destê xwe havête pêsîra xwe .hest bi çu tiştan nekir.

Dengê demjmêra bi dîwarîvet ser lê hêr kir. Çikçika wê, ji kuxka birazavay ge t ek nexweştir bû. hestê wî azirand. Kire gurgekê har, xwe havête ser ket exê wê yê rûs. Destên wê bi lêva textîve hişik girêdan. Pêyên wê, jêkvekirin, rûnişte ser ranên wê.

Destê xwe vekir, tila xwe ya şhedê kire di devê xweda, tijî ser tif kir, bi hemû hêza xwet kire di nîva mitayê wêra.

Qêrîyên wê, guhên birazavay kunkirin. Tijî ser patê kiçînîya wê xwîn bû.

Bêhna wî hat. Tena bû, li ber tenişta wê rûnişt.

— iha te hosa divêt? Tu bûye bûk yan net

Tijî difina wê bêhna xwînê bû. Cirfek vê ket. hate ser hişên xwet Li dor xwe zivirî, zava nedît. Recfka wê sist bû.

Qesta sîngê wî kir. Xwe di navda şidand. Têr kire girî.

— Te xêre dilê min? Te çi bû hosa dûr çoy? Bibore ,heker pirsa min hosa tu êşandibî. Tube bit, ez vê pirsê bikim.

Xwe pitir di nav sîngîda şidand, divîya sîngê wî kun bibit û di navda xwe veşêrt.

— Bigirî, têr bigirî. Girî çav û dilan ron dikin.

— Divêt tu bizanî ka çi hatîye serê min, da çu caran nebêjî ev jine ji bo pûçatîyê bi dû min ketîyet Baş bizane, tu mêrê êkêy, ji bilî he t alên min, destê xwe kirîye min. Bawer bike ^şta min bi çavê xirabîyê sehnekirîye çu ze t aman.

— ez bawer dikim. Xwe tore neke ,ez hemû tiştan dizanim.

— Divêt tu hemû tiştan ji jîyana min bizanî. Divêt tu bizanî ka ez çend rezîl bûyîmet da tu pitir hez ji min bikî, da tu çu caran, bi tinê, min nehêlî.

Bêhnvedaneka kurt

— Dewat verevî. her kesek ço mala xwe . Mal valabû, ez bi tinê di wê jora ciwan û nexşandîve, di nav destên hemey zêringir da Mam.

Piştî şeva zavatîya wî, şerim dikir bête jora min. Çend şeveka ez bi tinê nivîstim. Bêhna min fireh bû. Keyfa min ge I ek hat. Min digot, xwezî bibite êşek heta heta jê sax nebit.

Çend şevek borîn, min tirs ji bîr kir, ^ê min tena bû, ez bi hîvî ketim.

Şevekê, wek har û dîna hate jor, li hindav serê min rawestîya. Kire hewar û got:

— herwekû hosa bo te xweşe? Xwarin û vexwarin û nivîstin, tu ribîtebûy.

Dilê min tijî tirs kir. Berî ez baxivim, got:

— Dê hilo xwe rûs bike. da tola şeva zavatîya xwe li te vebikim.

Dilê min ji sîngê min derket. Min xwe asê kir, min kire hewar, min xwe vequta.

Kete ser sîngê min. ez bi zorî rûs kirim. Da me ber leqan. Lêvên min, hindî mêtin hişkkirin. Serê memkên min, ji mêtin ü leqdanê kulkirin!

Bawer bike, wê şevê çar pênc carekan, bi zorî di ge i min nivîst.

Dîsan tirsê di nav dilê minda cihê xwe girt. Dîsan ez bûme carîye.

Spêdeyê berî derketinê, xwe têr dikir. Nêvro dihate mal, berî nanxwarinê carekê duwa li ser sîngê min diçerî. eve ji bilî şevên wî yên taybet.

Direngeşev, serxweş dihat. her li derî xwe rûs dikir, nedihêla ez cilkên xwe ji ber xwe bikim. Di ber minda didirandin.

Digot, eve jî xweşîyeke ,her ^tê bi zorî bit xweşe.

heta spêdeyê li ser kel exê min dikire şer, nedihêla ez binivim.

Digot, nenive. Min tu bo nivîstinê nelnayî. Cilkên xwe neke ber xwe ,ez hêşta mayme ^şta min çu nekirîye, dê nihu zivirme bej na te.

ez ge I ek di wî halîda Mam. Xwîn ji ^ê min diza. ez hemû bûbûm birîn. Min jîyan nema.

Rojekê karek bo çêbû, çend rojekan ji mal dûrket.Li ber tenişta min rûnişt û got:

— ez dê du sê rojekan ji mal biçim. beta ez bêm dê birînên te sax bin.hişîyar be ji mal dernekevî.

Bi dengekê bilind kire kenî, hê§ta kenîya wî tijî mejîyê minet

ew sê çar rojet bûne sê çar çirket Êvarîyekê hate mal. Berî her tiştekî, berî silav bikit, qesta min kir. Nehêla ez xwe dirêj bikim. hema ji pêyanve û bi cilikivet bêhna xwe îna. Qêrîyên min tijî guhên xwe kir. Bi serketinve got:

— eve tola şeva zavatîya minet

ez wek mirîyan, ketme ser cihê xwet Min got, başe ew westîyaye û bêhna xwe îna, ez dê ev şeve têr nivim.

Bi şev zivirî. Wek tolazekê çarde salî, li hindav serê min rawestîya, got:

— Tu dizanî êdî dilê min naçitê ez ji sîngîve bême nik te!

Destpêkê ez di merema wî negehiştim. Min nezanî wî divêt çi bibêjit.

Destê xwe li pêsîra min da û got:

— Vê derê bêtam bûyet Divêt ez li cihekî dî bigerim.

Bi hemû hêza xwe ez lê xwerîm. Min lê kire hewar û gotê, ew piştî mirina minet Bi hestekê sar, kenîyeka bilind, tijî hemû kun û qulaçkên jorê bû.

— Te divêt wek mirovan xwe aqil biket te divêt wekî şeva bûkanîya te li te bikim?!

— Min got piştî mirina minet .. Te zanî?

Pirça min girt, û got:

— ez ya bi dilê xwe dê bikim, tu jî ya bi dilê xwe biket

Dîsan destên min bi lêva textîve girêdan û pêyên min jî wek wî vîyay, bi binê textîve girêdan.

Wek a$iqê peykerekê navdar, du sê caran li dor ke t exê min zivirî. Ageh ji girî û hewarên min nebû.

Kemaxên min bi wan destên zivir perxandin, bi hemû hêza xwe ,ez kêşa me di koşa xweda.

Dengê mirinê ji min derket.ez bêhiş bûm. Min ageh ji çu nema.

Piştî demekî, ez hişîyar bûm. Wek gêj û serxweşan li min hatbû.

ew li ser lêva textî cigareya xwe dikêşa. Bi serê lêvan got:

— Bibore, min tu venekirî, höşta ez mayîme .eve tinê bêhnvedan bû. Dibit ev şeve tu ge I ek wesa bimînî, da tu för bibî.

Careka dî, rabû ser xwe, Zikö wî yö mezin, neşîya wî koremarö di nav pösîra wîra veşêrt.

ez ji dil tirsîyam. eve cara êkêye ez bi duristî dibînim. ev parçeye ne yö mirovaye, Beşeke ji nöratîya nörekerekö hinşerî.

Min jinû zanî, ka ji bo çi hemey zöringir hinde jina diînit û ka ji bo çi hîz û jinxwaze,

Li pişt min rawestîya, wek îzraylî, destön xwe havötine kemaxön min, vö carö hödî hödî ez kêşame ber sîngö xwe, nîveka gîyanö min ço.

ez û ew û şev û roj... her gava wî vîyay.

Min jîyan nema. Böhna min teng bû. ez ge I ek lawaz bûm. Leşê min hemû bû xwîn û birîn.

Min kes nîne hewara xwe bigehînimö. Kesö ageh ji min nîne .ez dö di vö joröve bi kîrö hemey zöringir öme kuştin.

Şevekö, min birîyar da yan xwe yan wî bikujim!

Min got, heker min xwe kujit, eve öka dî kete tora wî. Divöt ez wî bikujim da jin jö tena bibin.

Min körek amade kir, dana di bin Balîfkö xwe.

Dîsan wek her car, li berdergehî, xwe rûs kir û got:

— ez diböjim tu bi aqil ketî, tu förbûy. Dö xwe bo min rûs bikî û li cihö her car amade bî. Ma ne sîlava min?!

ew aqilö di serö minda ew jî nema. Min dest da körö û qesta meşka zikê wî kir.

Dîsan ji min bi höztir bû. Kör ji min stand û ez da me ber şeq û pönan.

— eve bi sanahî bi ser difina tera nabort. Kiça sey, we li te hatîye tu körö bo min rabikî?

Min gotö heker tu mörî û xwedan şeretî dö min berdî. heker tu min bernedî. ez her dö te bikujim.

— Berî tu min bikujî. ez dö te bikujim. Lö ne bi körö, bel kû bi vî kîrî.

— Min berde. Ma tu ji min têr nebûy?

— Be I ê, ez ji te têr bûm. Lê hosa bi sanahî ez te bernadim.

— ez amade me. bo her daxwazeka te hebit. Tinê min berde . Te ez kujtim. Tu nemirovî.

— Dê were bê ezmandirêjî. Were cihê her car. Xwe amade bike .ev şeve em nanivin. Dê heta spêdeyê heqê xwe ji te çêbikim. Spêdeyê te I aqên te. dê kime nîva destê te.

Li ser milê xwe zivirî. hewar di nav hizirên xweda hêrbûye.

— Guhê te li mine ,eve seteke ez daxivim.

Bêy lê bizivirt, bi dengekê xemgîn.

— erê, bibêje. Min baş guh li teye.

— hewarê min, wê şevê ew nêreker, nenivîst. Leşê wî qe. newestîya. Qe. bêhna xwe venekir. herwekû hepik, dermanek xwarî. Nêratîya wî wesa dijwar bûbû, bawer bike wê şevê, ez nizanim çend caran hate nivîna min. Ji sîngîve. ji piştêve. çu reng neman nekirîn, çu şêwaz neman nekirîn.

Di ge ! bangê spêdeyê, destên min vekirin û got:

— Dê here hey kiça sey... Êk dû sê. her sê te . aqên te ji min biçin. Dilê min xwe bi lez quta, min bawer nekir. Min dest da cilkên xwe da bikime ber xwe û birevim. Li min kire hewar:

— Dê çi bikî? ew cilik min bo te kirîne. tu nabî.

— Pa dê rûs biçim?!

heqê teye tu rûs biçî. Lê ji şerma dinîyayê, dê wan gustîrik û zincîran ji xwe veke. Dest da kirasekê kevnej nên xwe.

— ha eve jî ji te zêdeye.

Tu bawer dikî, min dest havête derpêkurtkê xwe. da bikime ber xwe. ji dest min înader û got:

— ev derpêkurtke. min bo te kirîye. Nabit tu bibî. hema hosa here. Ma çi pêve maîye tu jê bitirsî!

ez bi tenka kirasî û bê derpê ji mala wî derke. im. hêşta dinîya tarî bû, got:

— Neçe ,he.a ez serê xwe bişom û nivêja spêdeyê bikim. ez dê te di rêya xweda bigehînim.

ez ji derve, li ber dergehê hewfê Mam, beta nivêja xwe kirî. ez kirme di pişta turmbêla xweda, bi wî seruberîve, li ber dergehê mala babê min danam.

Min nedivîya kes min wesa bibînit.

Babê min ji nivêja spêdeyê dizivirî. Xwe havête dergehê turmbêla wî û gotê:

— Kerem bike qurban, were jor.

— ez naême jor. eve kiça te, da tu bo xwe careka dî bifiroşî. Lê vê carê bi nîv qîmet. Kenîya wî û dengê çona turmbêla wî, ew kolan hemû hişîyar kir.

Babê min ji navçavên min û seruberê min, bersiva hemû pirsan zanî...

Careka dî... Mêrekê dî

— Di mala babê xweda, ez bû me pîvazeka genî. Kesê pûte bi min nedikir. Kesê ez nediaxavtim. Şev û roj, wek girtîya di jora xweda, xwarin û vexwarina min, dayka min, bi dizîve bo min di îna jor.

Bab û birayên min, her şev, kom dibûn, pilan dadinan, rê durist dikirin, ji bo kujtina min, ka dê çawa min kujin. Bê ku kes di gerewa minda bête êşan.

hind ji şerma dinîyayê û hind jî ji tirsa girtinê, divîyan rêyekê bibînin min pê bikujin.

Car digotin, em dê sojin û dê bibêjin ku wê ji kerbên mêrê xweda xwe sot. Car digotin, em dê kine di bin turmbêlekêda û dê bibêjin qezaw qeder bû.

Dayka min, razî nedibû, pişta min digirt, digot:

— her tiştek li kiça min bêt, ez dê hewe tûş bikim. eve şaşîya hewe bû. hewe bi zorî da wî gawrî. hûn egerin. Divêt hûn bêne kujtin, ne ew.

ez di wî halîda Mam. Ge I ek caran min hîvî dikir, min bikujin. Lê kesê ew mêranî pê çê nebû.

Min hizir dikir, demê bab ü birayên min, min bi wî rengî bibînin, dê hemey zêringir dine ber demanceyên xwe.

Min nezanî, ew demance, tinê ji bo keşxeyê di ber şûtkên wanrane,

erê hewarê min, sê çar heyveka, ez di wî halîda Mam. Sê çar heyveka, ez di wê girtîxaneya, min bo xwe durst kirî da Mam. Min roj nedît, min mirov nedîtin.

Rojekê, Mamê min hate mala me, devê xwe bire bin guhê babê min û bû pistpsta wî. Piştî ji wê pistpstê xilas bûy, enîya babê min ya girê vebû, rûyên wî tijî bişkurîn bûn, çavên wî zîq bûn. ew çend heyv bûn, cihê ez lê, berê xwe nedidayê. Berê wî kete min, çavên wî mizgînîyek digehand. Destê xwe li milê Mamê min da û serê xwe bi razîbûnê hej and.

Destê xwe bilind kire dayka min. Daxwaza hatina wê kir. Dayka min xwe çemande berdevê wî. Wî jî pistpstek di bin guharên wêda kir.

Dayka min destên xwe bilind kirine bin zikê esmanî û lêvên xwe livandin, tijî navçavan hîvî bûn.

ez birime di jora xweve, Li ber tenişta min rûnişt û got:

— Kiça min, min soz dabû te ,ez te ji wî zikmeznî bidime berdan û te bidime êkî bi dilê te, Ma newe bû?

Serê min hêşta yê çemîyay bû. Axivtin ji min nedihat. her wê got:

— Mamê te dostekê ge t ek baş heye, wek em hemû dizanin û dinîyasin te guh li minet Min guh lê bû. Lê min xwe bêdeng kir. ez di merema wê gheştim.

— Mamê te dibêjit, dostê min, kurek ge t ek baş û xwandeva û aqil û di jîyê teda heye, Daxwaza xizmanîya me dikit, tu çi dibêjî?

Kurek tolaz û ciwan û xwînşirîn û...

— Min divêt vê carê tu razî bî. em te bi zorî nadinê. Te çi got?

Bi rastî hewar, dilê min, xwe zêde quta. Min hest kir, ez hêşta hejî jîyanê me, Min bawer nedikir, ez dê ême nav mirovan. ez li hîvîya kujtinê bûm.

Min neşîya çu bibêjim. Çu axivtin ji min nehatin. Dayka min têgehşt, ez razî me .her zû mizgînî da babê min.

Min neşîya çu bibêjim, ew kabira, dostê Mamê min bû. Ge, ek caran dihate mala wan. Mamê min diço mala wan. her bi başî behsê wan dikir.

Min hind dît, rojekê Mirad, di ge I dayka xwe û babê xwe, li mala mene,

Seruberê wan yê xweşmirovan bû. ez nizanim çi bibêjim! Dibit min divîya ji wê girtîxaneyê û li hîvîya kujtina xwe rizgar bibim. Bi her rêya hebit. Bi her baceya hebit.

ez dirêj nakim, min xwe, bûk li mala Miradî dît, û ya dî tu baş dizanî.

— Ma tu pêveneçoy? Ma te pirsa wî nedikir?

— Da pirsa kê bikim?! Te halê min dizanî. Mamê min her bi başî û xweşmirovî behsê wan dikir.

— Niza çi bêjime te? Tu ne hejî vê hemûyê bûy.

— Ma ez çi bikim? Dîyare bextê min hoye, Min ge I ek caran digot, çawa tolazekê wek Mirad bi bi jineka wek min razî bibit? Min her digote dayka xwe, divêt hûn rastîya min bibêjinê da peşêman nebit. Dayka min digot, ew hemû tiştan dizanin û bawer nakin. Min nedzanî, li nav mirovên wî kes pê razî nabit. Kesê nevêt kiça xwe bikite di cobexaneyêda.

Min xwe ge I ek ragirt. Min ge I ek xwe asê kir. Min ge I ek bi çavên xwe dît.

heker ez nehatbam el manîya, da niho kujtî bim, yan da se^şa cobexaneyê bim.

Bibore, nuke tu dibêjî, ma eva tu di ge I min dikî ne qehbelîye?

— Ne ne .ez we nabêjim. ez baş ya dilê te dizanim. ez baş dizanim tu bê xwedanî. Tu wek min bê hevalî.

— ez çu car razî nedibûm. Lê min jî mêr divêt. ez jî jinim wek her jinekê. Tu bawer dikî, eve ge I ek caran min got, heyvê carekê min Mirad di nav nivîna xweda neddît!

herdem kar û roja bê kar, di ge I hevalên xwe heIa nîv şev dima. Demê dihate mal, serxweş û westîyay, êkser pişta xwe dida min û dinivîst.

ez têrbûm. Min hind şîya, xwe ragirim, bi taybeI piştî tu di jîyana minda dîyar bûy û min merema te zanî, min halê te zanî. Tu jî wek min bûy. Min hest kir, te xirabîya min nevêt. Tu jî wek min bê xwedanî. Bê yar û jinî.

Bêdengîyê her du şir kirin. her êk di nav hizirên xweda, ço dinayayeka dî.

— Da bo te tiştekî bibêjim.

Serê xwe bilind kir. Xwe qulpande ser teniişt& Destê wê girt û da ber maçan.

— BibêjeI sîlava dilan.

Kenîyê ser ji axivtina wê stand.

— Ne ne . Tu dê bibêjî tu yarîyan dikî, yan dîn û harî, yan dê bibêjî tu ya serxweşî.

— hema bibêje. Ne tu dîn û harî û ne tu serxweşî. Te tinê du sê perdaxên bîrê vexwarîne .ez

baş dizanim tu bi bîrê sexweş nabî... hema bibêje?!

— Ma bo?... Ma?

Dîsan kenîyê nehêla axivtina wê derkevit.

— Dê vêca bibêje. Te dilê min he I and!

— Tu bi xwedêkî ge I ek bi min nekene û ji dil hizirê di vê suhbelêda bike.

— Dê bibêje? soz bit ez nekenim.

— Tu ji dil hez ji min dikî?

— ew çi gotine .erê pitir ji dilê xwe.

— Di ser wan hemû ^tên bi serê min hatîn û ewa tu ji min dizanî, her te ez divêm?

— Ma çi hatîye serê te ?her ^tê hatibite serê te? ji hêza te zêdelirbû, ne bi dilê te bû. erê ez ji ber wan tiştan pitir hez ji te dikim.

— Ma bo, ma bo ez û tu nabine malek?!

her zû lêvebû, tirsîya, ev daxwaza wê, barê wî giran bikit. Tirsîya jê birevit.

— Bibore? bibore. Ji bîr bike. Min çu negot.

Vê gotinê, hişên wî, ji nav kartêkirina wê bîra vexwarî cemandin, hişîyar kir.

— Te çi got?!

— Çunine . Min got ji bîr bike.

— Ne ne. bibêje. Min guh li tiştekî bû. ez neserxweşim. hest bi kêmasîyê kir.

— erê, min got, em bo nabine malek? Madem te ez divêm û min tu divêy û tu ji ber tenişta min naçî?

Devê wî beşbû. Çav lê hilî bûn.

— Tu jina xwe berde ,ez dê mêrê xwe berdim. em dê bine malek. Dê bine jin û mêrên bi duristî.

Tu berde û ez dê berdim

Serê xwe ji nav destên xwe îna der. Dengê biçûkan, kenî û yarîyên wan, hizirên wî revandin.

Li ser milê xwe zivirî, wêneyê jina wî, bi xemla bûkanîyê li ber tenişta wî, tijî navçavan jîyane.

Li hindav serî, wêneyê wî di gel her sê biçûkan û dayka wan, di koka keyfêdane.

Dengê sîlavê di serîda deng vedida.

— Tu jina xwe berde ,ez jî dê mêrê xwe berdim.

Tezîlanik bi ser leşîda çone xwar.

— em dê bine malek, jin û mêr bi duristî.

— Jina xwe berde berde berde. ..

— Tu ji ber tenişta min naçî ... Tu ji mêrê min, pitir min dibînî. Tu ji wî pitir li nik min dinivî. erê... Jina xwe berde. da em pêkive bijîn.

Dengê qutana derguhê jorê, qutana dilê wî zêde kir. hewekû li benda sêdarê.

— Kîye?!

Dergeh vekir, tijî navçavan kenî û hîvîye .

— ezim. Ma ji bilî min, tu li hîvîya kêy bête di jora nivîstina meda?!

— Ne ne. lê!

— Lê çi? eve çend roje tu ji mal derneke?î. Tu naçîye karî. Tu bêtibe? bûy. Te xêre? Çi çêbûye?

— Çunine .ez nexweşim.

— Te çîye? Kîra te diêşit? Tu bo naçîye dixtorî?

— Divêt ez bêhna xwe vedim.

— Bila dilê min. Bêhna xwe vede. Xwe newestîne .em pêdivî tene.

— Kesê pirsa min ne kirîye?

— Be I ê.

Bilez nehêla axivtina xwe bi duristî bibêjit..

— Kê pirsa min kir?!

— hevalên te.

— Û kê dî?

— Tinê hindek hevalên te pirsa te kir. Nelirse, min bersiva wan da.

— Te çi gotê?

— Min gotê nexweşe. Ma ne xweş bersiv bû?

— Mala te ava.

— Xwezî tu her hosa nexweş bî, da tu li mal bimînî, da em te têr bibînin.

Kenî, kenîya wî her zû bû hizir û dûr bir.

Li ber tenişta wî rûnişt.

— eve demekê ge I ek dirêje ,ez û tu, li vî demê rojê, di vê jorêve hosa bi tinê ne. rûniştîne. Tu bi şev diçoy û bi şev dihatî. Ge . ek şevan, tu li derê dinivîstî. ez dizanim karê te wesa dixwast. Me du sê rojan tu nedidîtî.

Berê xwe da navçavên wê, hêşta tijî hîvîne. Serê wê dana ser sîngê xwe û givaşt.

Dengê sîlavê di serîda, mejî lê dixwar.

— Jina xwe berde ,ez dê mêrê xwe kime der. em dê pêkve wek jin ü mêr jîn.

Berde. .. Berde. .. Tu ji ber tenişta min naçî...

Dergeh vebû. Kurê biçûk ji ber birayê xwe revî, bi kenîve xwe havête di nîva wanda. ew nêçîra dayka wî dikir, ji dest da, her dû jêkvekirin.

Dayk bi lez bû, lê xwerî. her sê komkirine ber te. e.zyonê û dergeh lêgirt.

— Babê hewe nexweşe. Dengî nekin.

Bi lez qesta nêçîra xwe kir. Dergeh li pişt xwe girt. Xwe havête ser kel exê wî yê di nav hiziranda bûye êxsîr. Girêl kire ser textî.

— Tu evro ji nav destên min xilas nabî. Bila her tu nexweş bî. ez dixtora teme .ez derd ü dermanên te dizanim.

Sîngê xwe vekir. Serê memkên xwe nîşa çavên wî dan. Difina wî kire di nav memkên xwera û

şidand.

— iha eve dermanê derdê teyei

Ge l ek lêvên wî di sîngê xwe hosîn. Pirça wî, bi tilên xwei ge l ek şekir.

Ne serê memkên wê yên hêşta tijî jîyan, ne çavên wê yên tijî kil û ne pirça wê ya wekî şevê, ne bej na wê ya nêrgizan û ne hemû hewlên wê yên mê, şîyan dengê sîlavê û kenîya wê ji serê wî bînine der.

— Jina xwe berde ...em dê bine malek. ez dê mêrê xwe berdim. Tu jî jina xwe berde .em dê bi duristî bine jin û mêr.. Tu ji mêrê min, pitir li dev min dinivî...

Çend ya mê bû, çend xwe ciwankirbû. Xwe rûs kir, ew rûs kir. Ge l ek têkveda, ge l ek xwe wastand.

Neşîya wan girêkên enîya wî vekit. Neşîya mejîyê wî yê mijûl, hişîyar bikit.

Bi wan serudilanvel qesta jora xwarinê kir, di nav xem û kovanên wî yên giranda hêla.

— Jina xwe berde berde ...ez jina teme ,ez ji jina te pitir te dibînim. Tu ji ber tenişta min naçî...

Berdel .. Da pêkive bijîn. Berdel .. Jina xwe berdel ..

Pêniç dînar

Xew jê sil bû. Nivînên wê yên nerim û paqij, bûne stirî û kevlê jîjî. Jora wê ya lêkday,bû gorê tarî.

Dîsan bi tinê ma. Kes xemên wê sist nakit. Kes di daxwazîyên wê nageht. Kes hest bi azarên wê nakit.

— Tu li kûvey? Te çi li min kir? ez neşêm bêy te bijîm. Dê li tana min werel

Dengê wê negehişte çu guhan.

— Min çi li te kir? Min çi gote te? Min divîya tu bo min bi tinê bî...

Li ser milê xwe zivirî, mêrê wê wek kel exekê mirar, di xeweka giranda, xirxira wîye.

Di ber tenişta wî, xwe dirêj kir, tenişta wî sar bû. Destê xwe di lefê wî gêra, çu nîşanên nêratîyê nedîtin.

Devê xwe bire nêzîkî devê wî, bêhina araq û votkayê jê difirî.

Ge l ek hewldan, ge l ek li ser kel exê wî bizav kir, neşîya girê mêyatîya xwe bikujit.

Çav lê tarî bûn. hest bi tinêyatîyê kir. Zanî dê dîsan mînte bi tinê, dê mînte bê xwedan. Kes tênagehit. Kes nizanit ka wê çi divêt.

— Tinê, te derdê min dizanî, hey gawir, were bizivire .ez peşêmanim. Min gû xwar...

Jor pitir tarî bû. Pitir bêdeng bû. Tirsîya, nevêt wek ge l ekan jina xwe bi sanahî bifiroşt. Zanî dê pêdivî mêrekî bit. Bê mêr naqelînit.

— hewar, ez çi bikim? eve çend sal bûn, ez di xweşîyeka taybelda dijîyam. Kesê ageh ji me

nebû. Min çi kir? Min çi îna serê xwe ?her yê min bû. Min ji jina wî pitir didît. Çi dilreşî bû, min kirî?

Serê xwe dana ser Balîfkê nerim. Piştî ji wî ke l exê bi rexve bêhîvî bûyî.

— he l o.

— Be l ê? Keremkel

— eve mala Miradel

— Be l ê ,tu kîy zehmel nebit? Tu sîlavî ma nel

— Be l ê, ez sîlavim. Min nezanî tu kîy?

— Dengê te her wekî xweye I Tu nehatîye gihorîn.

— Supas. Ê...

— Niza ciwanîya te jî her ya carane?!

— Bawer neke? Mirov mezin dibit û xemên dinîyayê mirovî pîr dikin. Lê min nezanî...

— Lezê neke? Dê zanî ez kîme? Min divêt bizanim ka xemên dinîyayê hizirên te jî pîr kirîne?

— Dîyare tu baş me dinîyasî!

— Ji gîyanê xwe baştir.

— Te ez mereqdar kirim. heker tu nebêjî tu kîy, ez dê te I efonê danim.

— Ne neı bextê te da, tu dê wesa min kujî. Min divêt tu têr baxivî, min divêt dengê te tijî mejîyê min bit.

— Zû bibêje ,heker min dana.

— ez ewim, ewê te bi kenîya xwe şêt kirî.

— Biborei min demê van suhbefên çivêl nînei

— Raweste i Te I efonê nedanei min divêt te bibînim!

— Çi?! Te çi got?

— heker me êkudu dît, dê min baş nîyasî.

— Biborei

— ez naborim. eve demekê ge I ek dirêje ez li te diğerim. Piştî min tu dîtî, bi sanahî dest ji te bernadim.

Xwe qulpande ser tenişta çepê, çavên zîq, xew jê direvî.

Xirxira mêrê serxweş, hizirên wê tirsinok kirin. Xwe di nav cihê xweda kire qurmik.

Destê xwe ji nav destî kêşa, destê wê berneda, çavzlkanê dige I kir:

— Te ez nîyasîm?

— Niza, ev dême û ev seruçave li ber min nedibîyanîne!

— Baş berê xwe bide çavên min.

— Biborei mêrê min yê li van nêzîkan.

— Xema wî nexwei Jiblî pêkê wî, wî ageh ji çu nînei

— Dîyare tu wî baş dinîyasî!

— ez te jî baş dinîyasim.

— Neku tu jî...

— Neku çi? Te çi divîya bêjî?

— Çune çune.

— Ne ne bibêje. Tedivîya tiştekî bibêjî ü tişte giringe lewma rengê te hate gihorîn!

— Min hizir dikir, tu hevalê wîy.

— hevalê mêrê te?

— erê.

— Ji ber xatira çavên te nebit, ez silavî wî nakim.

— Bêhna min fireh bû. Te ez tirsandim.

— Ji çi tu tirsandî?

— Çune? ji bîr bike.

— Divêt tu dilê xwe û hizirên xwe vekî. heker ez dê hizir kim tu ya pîr bûy.

— he I be? ez pîr bûyme.

— Ne? tu ge I ek ciwantir lê hatî.

— Wey babo, wesa dîyare tu min baş dinîyasî!

— heker tu baş li çavên min binêrî, dê min nîyasî.

— Nuke te çi divêt?

— Min kenîya te divêt.

Kenî tijî cihî bû.

Destê xwe havête devê xwe. Li dorxwe zivirî. Mêrê xwe nedît.

— Ne tirse. Wî devê şirîn veneşêre. Wî ageh ji te nîne.

— ez ji te ditirsim!

— Ji min?!

— erê. Wesa dîyare tu ne bi sanahî.

— Te rast got. ez ne bi sanahî me.

Çavên wê yên tijî kil, ketine beranberî çavên wî yên gewir. Çavzlkanê kirin. Di ziviroka çavên wêda berzebû.

Li derê dikana wî ya cilkên jina derketin.

— ev parçeye bi çendêyet

— Bo te bi pêniç dînarane.

— Û bo xel kê?

— Bo xe l kê bi bîst û pênçane.

— Supas û evet

— ew bo te nebaşe.

— Ma tu qedara min dizanî?!

— Ji wan hêkên li ser sîngê te dîyarel

— Wey, tu çend bi dilî! Pa heker min tu bi vî şin^ qutayî?!

— Xwedana vê ciwanîyê û vê xemlê ji hindê mazntire min li vê kolanê biqutit.

Diser hindêra, qutana te. bo min xel ate.

— ezmanê te çend hilûye!

— eve rastîye .heker tu bawer nekî, were ber vê xwedîkê û baş sehke xwe .

— Min xwe baş dîtîye.

— Û te çawa xwe dît?

— Ne wek te gotî.

— ez bawer nakim. Lê...

— Lê çi? hema bêje şerim neke. Çu nemaye te ne gotî.

— Tu bê nesîbî!

— Te çawa zanî?

— ez hemû tiştan ji te dizanim.

— Dibit li destpêkê. Lê niho ez di ge l mêrê xwe bikeyfim û ge l ek bi dilê mine.

— Xwezî lê...

— Dîsan te got lê!

— Çune .ez hîvîdarim bi dilê te bit.

— Ma tu wesa nabînî?

— Roj dê bo te hemû tiştan dîyar kin.

— ez jî dê mînime li hîvîya rojan. Te ne got eve bi çendêye?

— ew bi kêrte naêt. ew ji te naêt. Were vî bibe .eve qedara teye .eve dê bi dilê tebit.

Dest havête wî êlekê di destîda. Bilind kir, zanî baş qedara sîngê wê dizanit. herekû, ge I ek caran bi destên xwe êlek kirîne ber. Zanî ji dil rengê wê divêt hilbijart.

— Bi rastî, te ya nîva dilê min zanî û eve ne girane?

— Ne? Vê carê dîyarîye? Careka dî...

— Ne ,ez dîyarîyan wernagirim. Divêt tu bihayê wî bibêjî.

— Min bihayê wî wergirtîye ?

— Çawa te wergirtîye? Kê daye te?

— Te û bê tu bizanî.

— Min?!

— erê te? Ma ev suhbele û ev kenîye û dêm û çavên te? dinîyayê bi hemû pareyên wêve naynin?!

— Supas. her ez bê pare nabim.

— Bibore .ez jî neşêm pareyan werbigirim. her carekê tu bikîye berxwe? dê hizira min kî. ez jî dê hest kim tu nêzîkî minî.

— Min got, ez bê pare nabim.

— Te ez şermzarkirim. Dê çawa pareyan ji te wergirim?!

— Bihayê wî bibêje, yê ke?îye dilê min. heker dê çime dikaneka dî.

— Dê hema ji ber xatira te? dînarekê dane û bibe?

— Dînarek? Ma benîşte?

— Dînarek bese . Da bêhna te jê bihêt. Dê wê dînarê beta heta hilgirim.

— Dîyare te nevêt bifiroşî. Bi xatira te.

— Were. were . Te bi çendê divêt?

— Bi bihayê wê yê durist.

— Dê hema pêniç dînaran dane û bibe.

— hêfta kême.

— Ne ne bese. Da tu ji min sil nebî.

Rast rabû serxwe. Qesta kentora xwe kir, el bomek ji bin cilkan îna der, têkveda, he.a pênç dînarek dîyar bûy.

— Te serê min hêr kir. ez te nanîyasim tu kîy?

Dest da çizdanka xwe. Pênçdînarek jê îna der. Navê wê bi dest xe.ê wê li ser bû.

— Tu vê pênçdînarê dinîyasî?

Tijî dêmê wê bişkurîn û kenî bû.

— Wey mala te .hêfta ev pênçdînare li nik teye.!

— eve ne pênçdînare .eve jîyana mine. man û nemana mine.

— iha ji nû min tu nîyasî.

— Dê vêca dilê xwe veke. Çi halê teye. Tu çawa dijî?

— Te rast digot. her tiftê te gotî, hate serê min. ez direng pêhesîyam. Çu ji min nehat. Min neşîya derdê xwe bo kesê bibêjim.

— ez ge . ek li hîvîya te Mam. ez piştrast bûm dê pefêman bî, dê tûş bî, dê daxwaza

harîkarîyê kî. ez ge ! ek ji te tirsîyam tu bikevîye bin pêyan, bikevîye ber pêlên wan yên dijwar.

— Raste. tu heq bûy, heker min xwe asê nekirba, heker em maban, da kevme bin pêyan yan da ême te . aftin. Lewma min zû xwe havêt û hatme e . manîya.

— Û niho?

— her ew mirove û xirabtire.

— Tu çawa dijî? Çawa razî?

— Li hîvîya mirinê me.

— Bibore ,hindî min tu divêy, lewma ez mayê xwe di jîyana te dikim.

— Supas. ez bawerdikim.

— Te çi li bere?

— Ji bo çi?

— Jîyana te. ma dê her hosa bimînî?

— Ma çi ji min diêt? Ma dê çi bikim? Piştî du mêr û sê biçûkan, ez ne li hîvîya çu me.

— We nebêje . Tu hêşta di koka ciwanîya xweday. Tu bo kê xwe disojî. Xwe gorî kê dikî?

— Ji ber xwe û ji ber bab û birayên xwe.

— ewên tu firotîe wî pîremêrê pîs. Yan ewên tu daye qondehekê bênamûs?!

— Raste. .. Tu wan baş dinîyasî. Wan mala min wêran kir. ewan ez firotim.

Tu bawer dikî, eve ez derke.îm, kesê pirsa min nekirîye .

— ez bawer dikim. Divêt tu jî pirsa wan nekî.

— ez nizanim çi bikim? ez nizanim çi başe.

— Gohê xwe bide min. ez û tu wek êkin.

— Kes wek min nîne.

— Tinê ez wekî teme.

— ez ji dinîyayê hemûyê ditirsim. ez wesa hizir dikim, her zel amê berê xwe didite min, tiştek ji min divêt. ez ji te jî ditirsim.

— Tu heqî ji ze . amên dinîyayê hemûyan bitirsî. ez newek çu ze . amame .ez wek sîlavê bê xwedanim.

— Wek sîlavê?

— Seda sed.

— Çavên te rast dibêjin, lê hêşta ez ditirsim. ez ji tirsê bûyme û dê bi tirsê mirim.

— Di ge . min, tirs Namînit. ez dijî tirsê me. Tirs ji min ditirst.

Kenîya wê tirs verevand. Pitir xwe bisteh kir.

— Te çi ji min divêt? Dê bo min çi kî?

— ez yê bê xwedan û tu ya bê xwedan. em dê bine xwedanên êk.

Kenî, ji dil kenî. Vê carê pûte bi mêrî nekir.

— Bi rastî, tu ezman hilî.

— Ne, we nebêje .ez ne ezman hilî me .ez derdê dilê te dizanim.

— Mêrê min, biçûkên min, xel ik û dinîya, tu hizira çu tiştan nakî?

— Ma kî hizira me dikit?

— ez di girtîxaneyêda me, Jîyana min tinê nan û nivîstine, Tinê xwedankirina biçûkane,

— ez dê te ji wê girtîxaneyê rizgar bikim.

— Dê min kîye di girtîxaneya xweda.

— Dê te kime di dilê xweda.

— Niza, niza çi bêjime te,

— Tu pêdivî minî. ez jî pêdivî teme,

— Û paşî?

— em dê ji dil dest bi jîyaneka dî kin. Dest bi evîneka dî kin.

— Û xe l ik? Û mêr û jinên min û te û biçûkên me? Te hizira wan kirîye? !

— hemûyan ji bîr bike, Bila ev çend salên mayîn ji jîyê me bo me bin. Bila bo xweşîya me bin.

— Ge ! ek zehme,e,

— Ge , ek sanahîye,

Serê wê giran bû. e , boma wêneyan dana cihê wê. Zivirî hindav serê mêrê di nav xirxira xewêda li pêş çavan wek mirîyekî xûya dikir.

Li jora rû^tinê hat û ço. Ke,e di ziviroka mêyatîya xweya harda.

I^ê wê azirî. Girê herzekarîyê berbûyê. Jîyê wê bû çarde sal.

Pirça xwe vekir, berda ser milan. Bendojka sîngê xwe vekir, bayê berê spêdeyê xweha nîva memkên wê tezand.

Kitkte, cilkên xwe havêtine ber pêyên xwe .her wekî zavayekê bi nîva dilê wê li hîvîya wê.

Rûs li nîva jorê pîyase kir, heta wastîyay. Qesta se^oyê kir. Di bin şirka ava gerim, lefê xwe yê ji mêran xerîb perxand. Destê xwe havête serê memkên xwe û givaştin. Bi tilên xwe nîva memkan du sê caran perxandin.

Jorda bire xwar, kete ser navka wê ya mê.

Çavên xwe neqandin, berperên hizirên xwe têkvedan, li bej na wî gerîya, li çavên wî yên hîz

gerîya, li tilên wî yên şîm gerîya.

Destê wê kete ser mûyên heram, mû têkvedan, wek marê birîndar, li kunekê gerîya da xwe têda veşêrt, da girê xwe bişkenit.

Berî tila wê ya şhedê niqon bit, kenîya hemey zêringir, tijî gohan bû.

Cirfek vê ket. Wek kasêteka tomarkirî, şeva bûkanîya wê hate pêş çavan. Dengê hemey zêringir bi ser şirşira avê ket .

— Tu bûye bûk ya ne, tu bûye jin ya ne?

Recifkê girt. Tijî pîstê wê tirs bû. Bi wê rûsatîyêve qesta mêrê nîvmirî kir. Xwe di berda dirêj kir.

Çend xwe nêzîkî ^ê wî dikir, tirsa wê zêde dibû. hest bi bêxwedanîyeka mezin kir.

Jor li ber çavan tijî dirinde bû.

Xesuwa wê hate derî, devê wê vayrosên bêşermîyê jê dirijtin. Milê ze I amekê zegzege girtîye ,

— ev zel ame, ge I ek zengîne , Dê tijî paxlên te pare kit.

Ze I amî hilda jor. Xesûyê dergeh li her duwan girt.

Ze I am li hindav serî rawestîya. Çavên wî nêratîya kerekê hinşerî jê dibarî.

Bêy silav û desturdan, şel ê xwe berda bin pêyên xwe, Navranên wî, ji yên hemû keran mazntir bûn. Xwe havête ser sîngê wê yê rûs.

Kire hewar, kire qêrî, berevanî ji ^ê xwe kir.

I^ê wê da ber leqan. Lêvên wê mêtin. Memkên wê perxandin.

hewarên wê negehiştine mêrê nivîsitî.

Ze I amî devê xwe havête devê wê, bêhna wê çik kir. Neşîya bikite hewar, neşîya bilivit.

Zikê xwe yê mezin bi zikê wê vena û şidand. her du pêyên xwei wek daralînkê, li dor pêyên wê alandin, ^ê wê asê kir.

Leşê wê yê ji ze I aman xerîb, hest bi xweşîyekê kir. Berevanîya wê sist kir. Li vîna wê zêde kir. Leşê wê gerim bû. Dengê gohnêlîyê bi ser ket. Kete di ziviroka xweşyêda. hestê mêyatîya wê har kir. Destên wê sist kirin. Bi hemû hesta xwet beşdarî di şert her du leşanda kir.

Nevîya ew zikê mezin, ji zikê wê vebit. Nevîya ew şer û givaştin sist bit.

Berî dengê zenga seatê ji wê xewa xweş hişîyar bikit, mêvanê wê li hindav serî, doxwîna xwe

dişidand.

Divîya bikite hewar, divîya mêrê xwe hişîyar bikit.

Zenga seatê hemû tişt xeware kirin.

Mêr hêşta nivîstîyei Jor valayei Leşê wê yê rûs, bênivêj bûyei Berî careka dî qesta se^oyê bikit.

— hilo Mirad, demê karê teye i

Befir xeman narevînit

Spêdeyê zû, di ge I her sê biçûkên xwe ji malê derket, ber bi xwandingehên wan birin. Bi rêve biçûkan, wek seyên şivanan di nav betirêda yarî û şe^ gilomçkana betirê dikirin.

Kenî û yarîyên wan, dengê turmbêlan û permîçkên betirê, hemû bûne êk. Neşîyan hizirên wê bel av bikin.

Li ber derê xwandingehê, biçûkan qesta hevalên xwe kirin, ew bi tinê hêla.

Nevîya bizivirte mala li pêş çavan bûye girtîxanei Li ber lêva cadeyê, ber bi jidervey bajêrî pîyase kir.

Rêveçûna wê, barîna betirê, ^ê wê di xwehêra ter kir. Wastîya, divîya rûnit, cih nebû.

Dinîya wek hêkeka spî xûya dikir. Li dor xwe zivirî, zanî ge I ek ji bajêrî dûr ketîye I

ew textê darî yê ge I ek caran di ge I hewar li ser rûniştî, tijî ser befire.

hêdî hêdî, bi destê xwe befir li ser textî malî. Cihê xwe paqij kir.

— Ne rûne wê derê. Were di koşa minda.

— Te ji ber minef Da ternebim?

— Ne nei min ji ber teyei da tu nesax nebî.

— Te nevêt ez nesax bim. Min jî nevêt tu nesax bî.

— ez nesax nabim. Raste ev texte sarei lê koşa min dê bite tenûr.

Kenîya wê befir ji ser bel gên dara werand. Li dor xwe zivirî, kes nedît.

Tijî lepê xwe befir kir û givaşt. Çavên xwe gêran kes nedît wê gilomçka befirê tê biwerînit. havête ber pêyên xwei Li ser milê xwe zivirî, clhê wî valaye i Bi tila xwe ya şehdê navê hewar li ser befirê nivîsî.

Li hindav navê wî, wêneyê dilê xwe çêkir.

Ge I ek li hîvîya tila wî ma, da ew jî navê wê binivîst, da ew jî wêneyê dilê xwe binexşînit.

— ev roja hinde sar. ev befira dibarit, li ber min wekî çilê havînêyei

— ew germatîya dilê mine didite tef

— û tu? Tu hest bi germê dikî?

— hişîyarbe! Ji koşa min dernekeve .heker dê jiserma mirim.

— Tu mirovekê hîzî.

— Te çawa zanî?

— Ji wî marê di koşa teda dîyar& Vê befir û sermayê tu ji ya xwe venabî.

— Tu dizanî heker mirov xwe di nav vê bef irêda rûs bikit û li ser vê mehfûra spî, ganekê bikit. Dê çi tam jê êt? Bawer bike dê mêjû li berperên xwe nivîst.

— We I a li nikte hemû rê diçine aşî. hema bo te duriste ,em we bikin.

— erê we i a li nik min duriste .i ha eve min xwe rûs kir.

Kenîya wê vê carê bi ser lêvên wê kef. Recifka ^ê wê zû hizirên wê cemandin.

— Divêt ez bizivirim, heker dê li vê çolê bime besitî.

Li durîyanekê rawestîya...

— Çawa biçine mal?

— Bi keyfa teye .

— heker bi keyfa min bit, em çu caran naçine mal.

— Pa te divêt em li nav daristanê bijîn!

— erî wekî kûvî û xezalan.

— Dê gurg me xwen.

— ez dê te xwem, berî gurgan.

Xwe havêtê, girêl kire di nav befirêda. hewar û kenîya wê, befir ji serê wan daran îna xwar.

— Ne ne. We neke. şerme. êk dê me bînit.

Xwehê da. Dengê razînebûna wê bo gohnêlîyê, pişta wê tezî, sîngê wê gerim bû. Qêrîyên wê lez li barîna befirê kir. Xwe bi kel exê wîve şidand. Şer gerim bû. Kefine gevzka xweşîy^ Tijî ser ^ê wan yê rûs permîçkên befirê bûn.

Şer sistbû, livîn nema. Kefine ser piştê bêhna wan lez dikir. Xweha ^ê wan di ge i permîçkên befirê bûne bestî. Lerzik kefe dilê wan.

Recifka ^ê wê zêdebû. Tarîyê pêlên xwe berdane nav daristanê.

Spîyatîya befirê neşîya reşatîya şevê vebirevînit. hest bi tirsê kir. Lezkir, bezî..

— ey hewar. ew spêde bû ez hatîm, nuke êvare. Biçûkên min li kûve mayîne? Li ber derî malî dê ji serma mirin!

Wek dîn û hara qesta mal kir. Li ber derê mala wê turmbêleka polîsa rawestîyay bû. Tirsa wê zêde kir. Rengê befirê girt.

— Çi bûye? Çi li biçûkên min hatîye?

— Tu dayka wanî?

— Be l ê ez dayka wanim. Ka biçûkên min?

— Net irse, ji ber sermayê di turmbêlêdane .em difên bizanin, tu li kûve bûy? Tu bo li mal li hîvîya wan nebûy?

— Biborin. ez li nav daristanê berze bûbûm.

— Li daristanî? Te li daristanê çi dikir?

— ez bo gerîyanê çûbûm, da demê xwe biborînim. Lê ez berzebûm.

— Netirse, Biçûkên te bi silametin. Lê...

— Lê çi?

— em ne§ên bidine te,

— Çawa?

— Wesa dîyare tu nefêy wan xwedan bikî.

— Min gîyanê xwe hemû gorî wan kirîye .ez ji ber wan dijîm. ez bo wan dijîm.

Polîsî berê xwe da hevalê xwe,

— em dê vê carê li te borin, careka dî, em dê biçûkên te bine cihekî ji te baştir xwedan bikin.

— ez supasîya hewe dikim û daxwaza lêborînî ji hewe dikim.

— Daxwaza lêborînê ji biçûkên xwe bike, ne ji me,

— Tinê min divîya bo demekê kurt di ge I gîyanê xwe bimînim. Min divîya xemên xwe bin ax bikim.

— Wesa dîyare, xemên te ji hêza te zêdene .em dişên harî te bikin. heker te bivêt.

— Supas. Tinê serê min mijûle, Min divîya di nav befrêda mejîyê xwe vala bikim.

— Ageh ji xwe û biçûkên xwebe, Be, ir xeman narevînit.!

Gerîyan li sîlavê

Gilopên barê vemirîn. Cih tarî bû. ew jina bi rexve, bi lez firek li wê şeraba di binê perdaxîda may da û karê çûnê kir.

— Şeva te xweş. Divên em biçin, dê barê girin.

— Dê kûve çin? Raweste hêfta zûwe.

— Ma tu nabînî? Gilop jî vemirandin.

Qesta derî kir, ew di nav destên wanda hêla.

Wek ge I ek şevan, dûya milên wî girtin ber bi dervey barê birin.

— Bibore ,em dê cihî girin. Şeva te xweş.

— Li van kolanan, dê çawa şeva min xweş bit ?!

— here mala xwe. Nav biçûkên xwe. Ma te mal û biçûk nînin?

— Mal û biçûk!

Careka dî, hest bi tinêyatîyê kir. Dilê wî sot. Rondik tijî çavan bûn.

Serê wî yê tijî hizir, di gel şerabê têkel bûn. Xew lê revand. Wek biçûkekê dayk lê berzebûy, dikire hewar û gazî.

— Sîlav... Sîlav. Te çi li min kir? Ka tu sîlava min? ew kolan tijî deng kir.

Turmbêleka polîsa li ber ke I exê wî rawestîya. Du polîs jê hatine xwar.

— Tu li van kolanan çi dikî? Tu bo dikîye hewar?

— hewe çi ji min divêt? Be I a xwe ji min vekin.

— hilo qesta mala xwe bike. Te divêt em harî te bikin?

— erê. hîvîye bo min sîlavê bînin.

— Sîlav kîyel

Kenî, Di ge I kenîyê kuxî.

— hûn sîlavê nanîyasin?!

— Nexêr. em sîlavê nanîyasin.

Rabû ser xwe. vehejîya, milê polîsî girt.

— Sîlav, dilê mine. Sîlav, jîyana mine. Sîlav...

— Başe başe me zanî...

— hewe zanî?

— erê me zanî.

— Dê herin bo min bînin.

— Dê were da pêkive biçin.

Milên wî girtin, kirine di turmbêla xweda. Ber bi mala wî birin. Jina wî jixew hişîyar kirin.

— Bibore xanim. eve ze I amê teye, dîyare dîsan ge I ek vexwarîe, ageh ji xwe nine.

— Supas bo hewe. Daxwaza lêborînê dikim.

— Supasî pê nevêt, eve erkê me ye. Şev baş.

— şev baştir. Dîsan supas.

Dengê wî bi dûv polîsanive dibezî.

— herin bo min bînin. Lezê bikin.

Jina wî li hindav serî rawestîya.

— Dê çi înin?

Serê xwe bilind kir, kartêkirina şerabê li ser zal bûbû. Neşîya ge I ek xwe bigirt. Li ber pêyên jina xwe kete ser erdî û nivîst.

— hilo here ser cihê xwe, te çi îna serê met Ma eve karê te yet Milên wî girtin, bire ser cihê wî, hêla di nav pêlên xewêda.

Li hindav serî rawestîya. Tijî çavan rondik bûn. Xewa wê verevî. Neşîya rûnit, neşîya binivit. Li hindav serî wek zêrevanan ma.

— Xwezî min zanî ba te çiyet Te çi divêt? Tu li çi digerî?

eve çend sal bûn ez ji te tena bûbûm. Tu bûbûy beşek ji gîyanê min.

Te tijî mal keyf û kenî û livîn kiribû. Raste, tu wek mêvanan bûy. Tu nîva şevê dihatî. Tu ge I ek şevan nedihatî, lê dema dihatîye mal, te mal tijî jîyan dikir, tijî bizav dikir.

Dîsan çi li te hat? Kê tu çavîn kirî? ez ditirsim tu wek caran bizivirî? Min gunhebar bikî. Bibêjî, min tu nedivîyay, babê min, zorî li min kir.

em li van xerîbîyan pêdivî te ne .ez ne§êm bêy te bijîm.

Xwe dirêj kire di ber tenişta wîra. Destê xwe bire ser sîngê wî. Cilkên wî ji ber kirin.

— Tu hatî sîlav?

Nezanî çi got. Baş goh li navê sîlavê nebû. Nevîya goh li çu tiştan bibit. Nevîya dilê wî bihêlit. Zanî yê li hîvîya tiştekî. Zanî pêdivî harîkarîyekêye.

— erê ez hatim.

Xwe nêzîkî leşê wî kir. Xwe pêve şidand. Goh neda wê bêhna mirara ji devê wî difirî.

— Dê were. . Min zanî tu bêy min neşêy bijî.

— erê ez bêy te neşêm bijîm.

— Were xwe nêzîkî min bike.

— eve ez li ser sîngê te me.

— Were didilê minda.

— eve ez didilê teda me. Ma tu min nabînî?

Danustandin zêde bû, suhbet berdewam bû. Leş harbûn. Deng mê bû. Çend şerab û araqa wê şevê vexwarî, neşîya nêratîya wî binivînit. Neşîya navê sîlavê li ser ezmanê wî rakit.

Ketine kel exên êk. Şerek mezin dest pê kir. Jin ji mêrî xerîbe .eve pitir ji du heyvane, mêr li ber tenişta xwe nedîtîye .evro bûye êxsîrê wê. Roj roja wêye.

Kete şe^ evîneka dijwar. ew jî di nav destên sîlavêda xwe kirîye yarîyeka xweştivî. eve pitir ji

du heyvane çavên sîlavê nedîtîne .eve pitir ji du heyvane. lêvên wê ne mêtîne. Çend ^ê wî

dihate mêtin, pitir xwe dimirand. Çend di nav sîngê wêda dihate şidandin, pitir xwe dimirand.

Çi bibit bila bibit, tinê bizivirt, tinê razî bit.

Şev ji nîvîyê borî, suhbe. û kenî tijî jor bû.

— iha min tu hosa divêy, lawê min. eve çend sale ez û tu hosa pêkive nenivîsitîne.

— Bila dilê min sîlav. Tinê tu bizivire. tinê tu sil nebe. te çi divêt ez amade me.

Xwe tênegehand. Nevîya çu eger, şeva wê têk bidit.

— Dê çavên xwe veke, da tu van hinaran bibînî.

Kenî, kenîya wî bêhna araqê jê dihat.

— Min hizar caran dîtîne. Ma te nedgot, tu ji mêrê min pitir dimêjî!

Serê xwe ji ser sîngê wî rakir. enîya wê bû girê. hest bi kêmasîyê kir.

Zanî ev vîstevale ne ji bo çavên wêye . Lê zû pe§êman bû.

— ez dînim! Ma ez nabînim di çi hal daye. Serxweş û ageh ji xwe nîne ka çi dibêjit!

Nehêla hizir, şeva wê têkbidit. Nehêla çu bekirok bikevne dinavbera wanda.

— Xwezî her şev tu serxweş baye. da hosa min û te keyf kirba!

— ez neserxweşim.

Dêmê wî hate gihorîn. Divîya ji nav destan derbikevit.

— Ne ne tu ne serxweşî. ez dizanim. Tinê min divîya bibêjim, xwezî tu jî wek zel amên xel kî

hatbaye mal, di ge l biçûkên xwe rûniştbay, bi xwarin û suhbet û li ber te l efzyonê di ge l me kom bibay.

Berê wê kele dêmê wî yê zer.

— Û hosa min û te xwe rûskiriba. hela spêdeyê tu li ser sîngê min nivîstbay.

Deng jê nehat. Zanî heker hişîyar bû, heker ageh ji xwe bû, hosa xwe di nav destanda nakite êxsîr, hosa bi dest nakevit.

Dîsan li ser sîngê wî yê nîv mirî, dîlana xwe dana, xemên xwe yên hinde salan, wê şevê derkirin. Kirmê mêyatîya xwe ya dijwar mirand. Girê xwe hela berê spêdeyê li ser kel exê wî tena kir.

Berê spêdeyê ji bo mîzê ji xew hişîyar bû. hêdî hêdî hişên wî kom bûn.

Leşê wî di ge l ^ê jina wî, bûyne êk. her du ^ên rûs di xwehêra ter bûynel Bi zorî xwe ji wê daralînkê vekir.

Berê xwe da cihî. jora nivîstina wîyel Jina wî bi wê rûsatîyêve. di xeweka giranda berze bûye I Tijî dêmê wê hîvîne.

ev ge l ek ji mêje. jina xwe hosa li ber tenişta xwe nedîtîye .eve ge l ek ji mêje. bi vî rengî di ge l jina xwe nenivîsitîye .

— Çi çêbûyet Min çi kirîyet

Qesta serfoyê kir. Piştî mîztinê, xwe da ber şirka ava tezî. hi§ên wî cemîyan. Xew û kartêkirina araqê di ge I pêlên ava tezî çûne xwarê.

Zivirî jora nivîstinê. Dêmê jina wî, di nav bişkurîneka pir hîvîda nivîsitîye ı

Xawlîyek havête leşê xweı bi wê rûsatîyêvei qesta jorên biçûkên xwe kir. Lihêfên wan bi serdadan. her êkî maçek li enîyê da. eve çend sale wî ageh ji biçûkên xwe nîneı Rengê wan li pêş çavan nemayeı

her li derê û li karî bû. Li rojên bêhnvedanê, li dîwana sîlavê serê xwe dixwar. Biçûk ji bîr kirbûn, jin ji bîr kirbû, tinê jivan û daxwazîyên sîlavê li hizira wî bûn.

Ge I ek li hindav serê wan ma. Ge I ek hizir kirin. Ge I ek bîrhatin hatine bîra wî.

Sar bû, recifkê ^ê wî girt. Zivirî jora nivîstinê. hêşta jina wî bi wê rûsatîyêve di nav pêlên xewêda nivîsitîye ı

Lihêf li ser wî ^ê cadoy rakir. Axivtinên sîlavê hatine bîra wî:

— Jina te ge I ek ji min ciwan û şîrîntire .ez nizanim te çi ji min divêt?

Ge I ek li hindav wî peykerê bironizî ma.

Serma tijî hinavên wî bû. Xwe dirêj kire di nav cihê xweda. Serma nerevî.

Xwe nêzîkî ^ê wê yê gerim kir, serma ji ber germa ^ê wê revî. Recifka ^ê wî sist bû. Pitir xwe bi pişta wê ya rûsve şidand.

Çend sîngê xwe bi pişta wêve dişidand, pitir tena dibû.

hest bi xweşîyeka mezin kir, demê xwe li ser sîngê wê dîtî. Dest bi şerekê dî kir. Vê carê şe^ wan ji dil dest pêkir.

Kete davê

Biçûk nivandin. Dergeh lê girt.

— Binivin, hewe sube xwandingeh heyeI

Kete beranberî xwedîkê. hêdî hêdî pirça xwe şekir.

— Pirça te ez har kirim.

— Pirça min bi tinê tu har kirî?!

— erê, pirça te wek davên kewgîrane ,ez ne§êm xwe jê rizgar bikim.

Dêmê wî, di xwedîkêra xûya kir. Divîya serê wî bikite di nav pirça xweda.

Divîya bi davên pirça xwe, yarîyan bi simbêlên wî bikit.

Destê xwe, dirêj kire dêmê wî. Destê wê bi şûşeya sar ket.

Recifk kete lefê wê. hest bi xerîbîyê kir. Lez li şekirina pirça xwe kir.

Dest da kilê çavan, du sê caran di çavên xwe hosî.

— Kilê çavên te ,ez kirme êxsîr. Reşatîya wan, wek mignatîsî, min dikêşne xwe, mêyatîya wan, min di ziviroka pêlên xweda niqon dikit.

— Tu van suhbetên xweş bo hemû jinan dikî yan bo min bi tinê?

— Tu nahêlî ez hizira çu jinan bikim. Te ez dagîr kirîme, ez girtîyê wan çavanim.

Destê xwe havête rûyên xwe yên hêşta digeş, hindek dermanik têdan.

Lêvên xwe bi ezmanê xwe terkirin. Bi qe I emê lêvan wek honermendeka şareza nexşandin.

— Tu ne birsîy?

— ewê lêvên te bixwet, ma dê çawa birsî bit!

— Min jî lêvên te xwarin, lê ez birsîme,

— Ma tu dê lêvên min û yên xwe înîye rêzekê?!

Destê wê kete ser gerdenê, jorda bire xwar. Bendojka sîngê xwe vekir. Nîva memkan baş dîyar kir. Tila wê kete coka memkan.

— iha eveye rêya jîyanê. her kesê rojê du sê caran di vê derê ra bêt ü biçit, çu car namirt.

— heker wesa bit, tu dê heta heta mînîye sax!

— ez ji mêje ji mirinê rizgar bûymet Min ava jîyanê ji vê kanîyê vexwarîye .ez ji mirinê mazntirim.

Serê mekê wê kire didevê xweda, wek biçûkekê sava mêtin, bêy bişkojka memkê wê berdit.

— Dê çawa mirim?! heker rojê du sê caran van hinaran bidime ber leqan?!

hest bi gezandina didanên wî kir, kenî. Kenîya wê jor tijî kir. Zivirî da di nav sîngê xweda

bişidînit, kes nedît.

enîya wê bû girê. Bej na xwe ge I ek kirêt dît. Çavên wê kerb ü kîn jê dibarîn. hemû tişt hêlan. Qesta jora xwarinê kir.

— Biborei Jina min, dotmama minei Min sê biçûk henei Min çu xirabî jê ne dîtîyei dê çawa berdim?! Dê çi bêjime kes û karên xwe? Dê çi bêjime babê xwe? Bibore ,ez neşêm, ne bi sanahîyel

— ez jî xwedan bab ü bira û mirovim. Min jî sê biçûk hene? ..

— erê lê?

— Lê çi? ha?

— Mêrê te yê pûçe? Qondehe ? Babê te tu firotî. Birayî tu daye bi ganekê.

Gotinên wî di serîda deng veda. Mejî lê hêra.

— Mêrê te qondehe? .. Qondeh...

— Babê te tu ya firotî... Ya firotî...

— Birayê te tu daye bi ganekê...

— Tu newek minî... Tu ne wek kesêy...

Dengê şkestina sênîkekê, hişên wê cemandin.

Bi dengekê bilind kire hewar:

— hewar... Dê çawa ji eşqa te rizgarbim?! Dê çawa gehme te?! Dê çawa dîsan te razî kim?

eve demekî dirêje xwe nîşa min neday. Xwe berze kirîye? Ne te I e?on û ne peywendî! hosa bi sanahî te ez ji bîrkirim?!

Dengê zenga dergehî, hemû xem û hizirên wê berzekirin.

Li ber xwedîkê, pirça xwe durist kir. Lêvên xwe teyîsandin. Birûyên xwe tîj kirin.

Dergeh vekir. Mêrê wê Mirad di ge I du hevalên xwe hate jor.

Li ber dergehî, her du heval hatine destî û dane bersîngê xwe û her êkî du maç li rûyên wê dan û destên wê girtin û hildane jor.

— Bibore sîlav xan, em gîrobûn, me hindek tişt kerîn.

— hûn bixêr hatin. Xem nakit. Şev höşta li despêkêye.

— Min ew şerab îna, ewa tu hez jö dikî.

Dest da şûşeka şerabö bilind kire ser mêzê.

— Supas.

— Supasî tinö bo te ye ,hey dilö min. hevalö wî xwe nerazî kir.

— Dilê me hemûyane. Ne yö te bi tinöye.

— Biborin, divöt ez xwarnö amade bikim.

— Lezö bike ,ez ev şeve bihöz û zewqim. Dibit te digel şerabö bikime mizze.

Kenîya wan ya sêwîyan bilind bû. Dengö mörö wö li dawîyê hat:

— hişîyarbe. bo min jî pirteka wö mizzey bihöle .

Dîsan kenîya wan tijî jor bû. Di ber kenî û suhbelön xwera möze xemland.

Neşîya beşdarîya kenîya wan bikit. Qesta jora xwarnö kir. Recivfkö girt. hest bi tirsö kir. Böhna ^ê hemeyö zöringir tijî jor bû. Tilîlîyön xesuwa wö tijî gohan bû. Wöneyö wö ji wan dîwaran venebû. Didanön wö yön rizî, kenîyeka bêşerim jö dibarî:

— Qehbe. tu xwe li ser serö me şerîf dikî! Ma em nizanin berî tu böye di mala meda, te çend gan dayînel

Lerzikö dest û tilön wö girtin. Neşîya çu bikit. hişik ma rawestîyay.

— Were min rizgar bike. Were ,ez dö kevme bin pöyan. Were. tu gunhebarî, tu egerî. Were , ez neşêm xwe li ber van pölön dijwar bigirim. Were. .. Were. ..

Böhna mövanan teng bû.

— em nehatîne xwarinö bixwen. em hatîne te bixwen. Tu were rûne, bila Mirad xwarnö amade bikit.

Pûte pö nekir, pişta xwe dayö.

Mövanî ji piştive girt, kire di koşa xweda. Givaşte nav sîngö xwe.

— iha ev qone, xwarna dinîyayê hemûyê diînit.

Destên xwe havêtine memkên wê û perxandin.

Hemeyê zêringir, bi wî binizkê nêrekeranive, li pişt amade bû.

Dest da wê çeqoya zel ate pê hûr dikir. Li pişt xwe zivirî, kete beranberî mêvanî. Çeqo dana ser riha stûyê wî.

— heker tu xwe nekîye mirov, dê te bi vî çeqoyê kime mirov! Dê derkeve ,hey te didayka Mirad gayo.

Mêvan zer bû, nemêr bû, bi wan serudilanve qesta jora mêvanan kir, wek pepûkan rûnişt. Recifka ^ê wê zêde bû. Neşîya xwe li serpêyan bigirt. Rûnişte ser kursîka bi rexvet Mêvan li hîvîya wê man, her çendekê Mirad dihat û lez lê dikir:

— Te xêre dilê min?! Mêvan dipirsînel

— Be l aya xwe ji min veket Min hizar caran gotîye tei ez ne qehpa te me ,ez jina te met Ma ne şerme tu hevalên xwe bo jina xwe diînîe mal? Ma neşermet

— Dilê min. her^tê ne bi dilê te bit neke .ev hevale koma pareyanei Dê me di ge l xwe bilind kin. Tu jî bo xwe hindek yarîyan pê bike û berîkên wan vala bikei Ma dê tiştekî ji te vekin?!

— Tu kurê dayka xwey. eve axivtina dayka te bû. her dubare dikir. Ma dê tiştekî ji te vekin?!

— Bila ev şeve jî bi silametî biborit. Sozbit êdî ez wan mêvan nekim mêranîyê xwe li serî da:

— Pa tu bo ji koşa hewarî dernediketî? Yan ew bi dilê tebû?

— Pêlava wî serê te û van bênamûsan diînit. Behsê wî nekei Gurî kete hinavan. Vîya erd biketşit û di navda biçite xwarê:

— ew jehra amadeye ,here bo xwe û wan bibe .ez di ge t hewe rûnanim.

— Bila dilê min, xwe tore neket Dê ew bit ya te divêt. ha vê pêkê şerabê vexwet da tu tenabî.

— ez çu tiştên wan venaxwem.

— Min ji ber te înaye .ew çi senet Bila xwarina xwe bixwen û biçine gorê babê xwet

Pêkî pêk kêşa, firê fir kêşa. Li nîva şevê xwe li ber tenişta mêvanî, rûs dît.

Rabû ser xwe ,hi§ên xwe cemandin. Divîya bikite hewar. Divîya bikite girî. Divîya mêvanî bi destên xwe bixendqînit. Tirsîya, ne§êt.

hewara xwe gehande mêrê xwe. Mêr di koşa mêvanê dîda ruse.

Ser lê wermî. Dengê wê bi serneket, neşîya bigirît. Neşîya bilivit.

Serma berê spêdeyê, recifaka leşê wê yê rûs zêde kir. hate ser hişên xwe. bawer nekir. Careka dî bi wê rûsatîyêve ,hemû tişt di çavên xweda tomar kirin.

Qesta jora xwarinê kir. hewara xwe gehande wê çeqoya êvarî bi karînay. Vê carê ji dil birîyar da, ev şeve. Mirad û herdu mêvanan bikujit û paşî xwe di pencereya xanîda pavête xwar.

Berî çeqoyê hilgirt, dengê girîya kiça wê ya biçûk ji bin pêyan hat. Çeqo hêla. Kiça xwe di nav sîngê xweda givaşt.

— Negirî kiça min, net irse . Te ci divêt?

— Mîza min diêt.

— Were. netirse.

Ji bîrkir ku rûse. Kiç dana ser tewalêtê, hindek ava tezî havête çavên xwe ,hişên wê hatine serî. Dêmê xwe di xwedîkêra dît, şerim ji çavên xwe kir, wek çavên xesuwa wê xûya dikirin.

Xawlîek ji se^ûyê bi sermlên xwedada. Kiça xwe kire di nav cihê wêda.

Divîya bizivirte ser karê xwe. kiçê nehêla.

— Neçe dadê. ez ditirsim, were li nik min binive.

— Netirse kiça min, ez nacim.

Xwe di ber kiçêda dirêj kir. hêşta kartêkirina vexwarina şevêdî, serê wê bernedaye. Çend divîya xwe ji kiçê bidizit, kiçê destên xwe di gerdena wê alandibûn û bernedidan. Leşê wê yê sar, di nav nivîna kiçêda gerim bû, xav bû, ke.e nav pêlên xewê.

Dengê mêvanan ji wê xewa giran hişîyar kir:

— Spêde baş. eve em çon, he.a şeveka dî bi xatira hewe.

Mirad bersiv da:

— he.a şeveka dî, hûn bi xêr biçin.

Cirfek vê ket, divîya rabit, divîya birevit, divîya ewa hatîye serî, bibite xewin û jê hişîyar bibit. Serê wê hê§ta yê giran bû, hizirên wê tevnê tevnepîrka bû, rê û paşeroj li ber berzebûn.

Neşîya cihê xwe bihêlit. Neşîya li dor xwe bizivirt. Nevîya ewa dîtî bibite rastî.

— Xewin bû... erê xewin bû!

Çavên wê bi le§ê wê yê rûs ket.

— Wey hewar. Xewna çi, halê çi. Min xwe bi erzanî firot. ez berzebûm.

Divêt ez rêya xwe dîyar bikim. Divêt ez bizanim ez çi dikim. Divêt ez gohê xwe nedme Miradê qondeh.

Dengê Mirad ji jora dî hat:

— Sîlav, karê biçûkan bike da di rêya xweda bibime xwandingehê. Lezê bike, demê karê mine.

Serê xwe hej and:

— Xwe lî bi serê min û yê biçûkan. Ma biçûk û kar û mal û jîyan bo çine ?heker mirovî şeret nebit?!

Di gel dengê girtina dergehî, dergehê hizirên wê vebû.

Bi tinê ma. Mal bêdeng bû. Biçûk çon xwandgehê. Mêr ço karî.

Jor bo jorê gerîya, çu tişt nedît xwe pê mijûl bikit.

Şeva borî wek kasêteka şêlî di serîda kardikir.

— eve min çi kir? Çi li min hat? Min çawa gohê xwe da Miradê qondeh?

Dê min wek xwe lê kit, wek xwîşkên xwe lê kit.

Serê xwe da ber tepan, tijî çavan rondik bûn:

— Ax ez çi bikim? ez hewara xwe bigehînime kê?

Gotinên wî hatine bîrê:

— Tu baş dizanî li vî wel atî jin ji hemû tiştan pitir hene .ez li jinan nagerim, ez li sîlavê digerim. Min divêt harî te bikim, te ji vî seruberî bînmeder.

Dengê girîya wê tijî jor bû:

— Ka tu hewar? Dê were min ji nav destên van bênamûsan rizgar bike. Dê were direwkero. Dê were ez dê berze bim, tu egerî.

Çavê wî bi te I efonê ket. Sehkire wê seata li hindav serî, ge I ek zû bû. Neşîya xwe bigirt:

— he I o? Spêde baş.

— Spêde baş, keremkef

— eve mala kak hewaref

— Be I ê. Keremke.

— ez dişêm di ge I kak hewar baxivim?

— Bibore hewar ge I ek nexweşeI Neşêt di ge I kesê baxivit. ZehmeI nebit tu kîy?

— ez sîlavim, jina Mirad. Miradî pirsa wî dikir, wî ji ber karî, dem nîne te I efonê bikit. Gote min pirsa wî bikeI Ka halê wî û yê biçûkên wî çiyeI

Navê sîlavê di serîda dengveda. ev nave ge I ek caran goh lê bûyeI

— Supas. em ge I ek başin.

— Bibore heker min tu mehtil kiribî. hîvîdarim rêzuslavên min û yên Miradî bigehne kak hewarî û çavê biçûkan jî maç bikeI

— Supas me jî silav bo kak Miradî hene û tu jî çavê biçûkan maç bikeI

— Dîyar bin, nik meve werin.

— Xema xwdê.

— Demekî xweş.

— Demê te xweştir.

Dengê hewar ji jora dî hat:

— ew kî bû?

— Çune ,hevalên biçûkan bûn, pirsa wan dikir.

Li ber tenişta wî rûnişt. Li hîvîya tila wî bû ka dê direj kite çi, da bi lez bo bînit.

Sîlavê te I efon dana. Xemên wê wek şilxa mê§ên hingivînî, ser lê wermand. Kete beranberî man û nemanê. Kefe di zivirokeka dijwar da.

eve hewar ço, dest jê berda. Bab û birayan ji bîr kirîye .heval hemû li hîvîya ket ina wênet da bara wan jî tê hebit.

Ser lê bû êş, çavên wê zivirîn, hest bi gêjatîyê kir. Dilê wê reş bû.

Qesta se^ûyê kir, hewil da dilê xwe rakit, neşîya. Serê xwe yê giran da ber şirka ava tezî, hişên wê hatine serî.

Cilkên xwe ji ber xwe kirin. Xwe da ber şirka avê, hest kir, xem û gunehên wê di ge I pêlên avê çone xwar.

— Tu dizanî hêşta min di ge I her du mêrên xwe serê xwe neşûştîyef

— erê ez dizanim. Min jî di ge I jina xwe serê xwe neşûştîye i

— Dê pirça min şekeı Dayka min ez dikirme di testêda û pirça min şedikir û di berra stiran bo min digotin. Divêt tu jî wekî wê bo min pirça min şekî û stiranan bêjî, heker dê ji koşa te ême der.

— Bila li ser çavan:

Tilên xwe hêdî hêdî bi pirça wê da birine xwar:

Şeke şeke canê şeke Canê tu pirça xwe şeke Kezî û biska hêdî veke Canê tu pirça xwe şeke Dilê hewarê jar kerke Canê tu pirça xwe şeke Derê xemên min tu veke Canê tu pirça xwe veke

hest bi sîngê wî yê gerim kir, xav bû, divîya di koşa wîda binivit. Wek biçûkekê sava, bi destên xwe serê wê bişût.

Divîya di nav sîngê wîda heta heta binivit, çu car ji vê xewnê hişîyar nebit, da xewna şevödî bibite aşob.

— Bêje ,hêfta bêje. Dengê te bo naêt?

Kesê bersiv neda. Li pişt xwe zivirî, kes nedît. Tijî derzên le§ê wê tirs bû. Pêlên sermayê tijî hinavan bû. hest bi kerên besitîyê di hinavên xweda kir. Tirsîya. Ji dil tirsîya. Bi wê rûsatîyêve. qesta jora xwe kir.

Di nav nivînên xweda xwe kire qormik.

— Ka tu bêbext. Te ez fêrî xwet irotinê kirim. Were ,ez pêdivî te me. Wek bab û birayên

min, min bi tinê nehêle. Tu jî wek wanî. Tu jî wek birayê minî, wek mêrê minî, çu ji wan cuda nînî.

Pêlên germê, hêdî hêdî bestîya hinavên wê he I and. Gehên ^ê wê yên wastîyay, xav kirin. Xesuwa wê, li nîva hewşê rawestîyaye. lewendîyên wê bûyne qamçî.

Çend carekê di bay diwerînit, dengê birûsîya jê dipej it.

ew, ya bûye canîya mahîneka kûvî. hevsarekê asê û lixavekê asnî di serî kêşayne.

Binê hevsarî, bi qurmê wê daretûya di hewşa wanda girêdaye.

her çendekê qamçîyek li teniştên wê yên nazik didit, vizka xwînê ji serê qamçîyê dizêt.

Xesû, wastîya. Canîya mahîna kûvî, kehî nebû.

Kenîya xesûyê, bi ser kolanê ket . her du tilên xwe kirine di devê xweda.

Fîtîyek veda, gohên wê kerkirin.

Hewiş tijî gurgên har bûn. hemûyan pêkive qesta canîya mahînê kirin.

Dane ber leqan, pirtên ^ê wê, tijî hewşê bû.

Serê wê di nav lixavê asnîda, hêşta şer dikir, hewar dikir, daxwaza harîkarîyê dikir.

Mirad ji wêve hat. Li hindav wî serê tijî xwîn û hîvî rawestîya. Li pêş çavên hemûyan, doxwîna xwe vekir, mîzte bi kiloxkê wêve.!

22 -10 -2007 nürnbêrg
**

ŞOPÊN GEŞ

Bîranînên Gerîla I
Amedekar
Şivan KAVÊ
Aynûr AMED
Doğan XEZNA
Weşanên Dibistana Wêje ya Sarya-Baran
1
Çapkirin: Adar 2003
Çapxane: Çapxaneya Ronahî
2
NAVEROK

Pêşgotin…… 5
Şerê yekemîn…… 7
Mirinê her kêlî silav dida……. 13
11 Stêrkên asîmana welatê me……... 20

Wî jiyana xwe kir qelena jiyanekî…….. 34
Çiyayê Reşkê…….. 40
Ew şev ji bîr naçe……. 50
Birînêk bêderman…… 56
Xatir xwestinek, bêdeng…….…….. 64
Me bêşer hêviya xwe parast……..... 71
Soz û peyman di rêya wan de…….. 76
Hêviya di xaka mirî de……. 88
Serûwena ku nivî de ma…….…… 99
Êvar derya…….…… 107
Ax ji xwînê hêza xwe digire…….…….. 117
Pepûleya çaremîn…….. 121
Wî baştir didît……..... 124
Berfa sor……..... 127
Rastiyêk ji awiran dûr ……..…….. 135
3
4
PÊŞGOTİN
Di dîroka her netewekî de wêje xwedî cihekî mezin û pîroz e. her gelekî û bi taybet jî her şoreşekî têkoşîn û serpêhatiyên xwe û welatên xwe bi wêjeyê kirine mîrasê paşiyên xwe. Wêja ya sedsala bîstan jî, mînaka vê yekê ye. Sedsala bîstan ku bû şahîdê gelek şoreş û serhildanan, di berhemên wêjeyî ên wan şoreşan de baş diyar dibe ku serdemeke çawa derbas bû? Wêje ya ku di siya şoreşê de li pêş ket mora xwe di sedsala derbasbûyî xist. Berhemên ku di dema şoreşa Oktoberê, Kuba, Angola û hwd. derketin mînaka herî berbiçav e. Di hêla din de, wêjevan û nîvîskarên

ku di wan deman de derketin ji zêdetirên xwe di bin bandora ramanên şoreşgerî de rewşenbîrî li pêşxistin. Ronakbîrên ku li tevahî cîhanê û bi taybet jî li Rusya, li Emerîka Latîn, li Filîstîn û hwd. derketin jî, di berhemên wan de diyar dibe ku ew bûne bersiva gerîna azadiyê a gelê xwe. Di vê yekê de ronakbîran erkekî mezin bi cîh anîn.
Belê, şoreşa Rizgariya Netewa Kurd jî mînakêk ji van şoreşa ye. Bi dirêjahiya şerê çardeh salan, bi sedan bi hezaran bûyerên tirajedîk, bi jan û derasayî rûdan. Ger em bêjin ku li her deverekî welatê Kurdan bûyerekî rûdayî daye wê neşaş be. Di her bûyerekî de jî, xwîna lawekî an keçikeke Kurd rijiya ye. Di dirêjahiya şerê çekdarî de gelê Kurd her cengawerekî gerîlayekî Kurd bûye şahîd. Bi sedan bûyerên bi êş û jan. Her yekî ji wan bi sedan caran şewitandinên
5

gundê welatê xwe, koçberiya gelê xwe, şehîdbûna rêhevalên herî hêja li ber dilê xwe, bi çavên xwe dîtin e. Gelek caran gava ew diketin, cengê de, mirin mîna guleyên ku li ber wan diketin, wisa silav dida wan û derbas dibû. Wate, heryekî ji wan bi sedan caran mirin bi çavan dîtibû. Êdî dilê wan bibû mîna wargeha bîranîn û serpêhatiyên welatekî ji jan!
Her bûyerekî bibû mîna gulokekî rîs di dilê wan de. Lê, ma ewê tenê di dilê wan de mabana? Na…Pêwîst bû ku ew bîranînên biban mîrasekî netewî ji bo nîfşên paşerojê…û wisa bû! Pênûsê sê destan ew erkê pîroz girtin ser milê xwe. Hersê kesan pênûsên xwe kirin teşî û bi gulokên bîranînan ku di dilan de rawestiyayî bûn, dest bi hunandinê kirin. Ev pirtuka

ku hûn dixweynin jî, hûnandina ku hersê pênûsa kirine ne. Ew hîn jî digerin bi xêzkirina wan bîranînên ku kesî nedîtine û jî bihîstine didomînin. Tişta ku di hembêza vê pirtûkê de hatiye nivîsandin, beşekî pir biçûk ji serpêhatiyên gerîlayên Kurd, wate mîna dilopekî ji deryaya jan û êşê wan e.
Di dawî de hêjayî gotinê ye ku beşa duyem ê pirtûka bîranînên gerîla wê di demekî pêş de derbikeve.
Şivan KAVÊ
6
ŞERÊ YEKEMÎN
“Laşê bêserî hatin ekranê! Serî li derûdora laşan bûn.
Min got qey hinek dîmenên filman amade dikin, lê ne wisa bû!
”
Şoreş ji bo min xewnek bû. Azadî ji bo min armanc bû.
Lewra di her rabûn û rûniştina xwe de min behsa welat, gerîla û şer dikir. Sal 1988 bû. Şoreşa Rizgariya Netewa Kurdistan ku agirê zayîna wê nû belav bibû, bi germahiyekî bêsînor dihate guftugoh kirin. Li kolanan li bajaran li gundan her roj gel di nava xwe de behsa şerê gerîla dikirin. Wê demê ji wan dihat gotin; “Apocî” û hineka jî digot “yên ji me çêtirin.” Ez jî di wê demê de ciwanek bûm. Heskirinekî min ê mezin çêbû ku ez tevlî refên şoreşê bibim. Lê wekî ku her-kes dizanî di wê demê de zêde tevgera hevala nebû. Ji ber ku hîn gel di nava wê tirsa ku dijmin bi darê zorê di nava wan de dabû rûnişkandin. Wate çûn û hatina hevala jî zêde li gundê me nebû. Fikrê min her timî belav bû û ez difikirîm; “ez ê çawa xwe bigihînim serê çiyan. Xeyalên min dûr diçûn. Min carna xwe weke bazêkî didît, ku li ser Çiyayê

Cudî difiriyam û li ser lûtke ya wî datînim.” Demek bi vî rengî derbas bû.
Min berê xwe da “Îstanbul” lê ez çi biçim...Min nefret ji xwe kir. Dinya li ber çavên min tarî bû, ji ber ku li wê derê tu rûmet nedidan kurdan. Berde kurd heger bizanibûyan ku tu rojhilat a Anadolêyê, wate bakurê Kurdistan kesekî kar nedida. Bi çavsoriyekî tijî kîn mirov temaşe dikirin. Lê tişta ku herî bandor li min kir ev bû. Şevêkî dema em li ber
7
ekranê televîzyona Tirkan rûniştibûn, laşê bêserî hatin ser ekrana. Serî
li derûdora laşan bûn. Min got qey hinek
dîmenên filiman amade kirin. Lê ne wisa bû. Ew dîmen bi rastî bûn. Ew serê gerîla bûn. Piştî ku ez tevlî bûm min navê yek ji ew hevalana jî fêr bûm. Ew serî yek jî ê heval Adîl bûye.
Min ji wê rojê ve xwe nema girt. Ez hema vegeriyam gund. Min ji bavê xwe re got; “belkî ev cara dawî be ku em hevûdu bibînin.” Malbata me zêde di nava ramanên kemalîzmê de nehatibû helandin. Ji ber ku di rabûn û rûniştandinên xwe de wan silav didan Çiyayê Cudî. Lewra aliyê welatparêziyê her li pêş bû. Bavê min jî wiha bersiv da;
-Kurê min rê li pêşiya we vekiriye. Hûn çawa ji bo xwe baş dibînin. Wisa bikin.
Bi wê dilşewatiya xwe û xemginiyekî ku ez di vê nivîsîdê nikarim xîz bikim lewra hestê min tevde wekî di nîva agir û çiyayekî berfê de mabû. Min dest bi lêgerînê kir. Dem payîz bû, meha Îlonê bû. Daran kirasê xwe ji xwe kirin.

Min mîlîsan dît û ez bi wan re axifîm. Her çendê min partî bi şêweyekî zanistî jî nas nekiribû. Lê ez di wê baweriyê de me ku xewnê mirov çi bin ew ê bixwazê di jiyanê de heyanê ku derfetê wî hebe pêkbîne. Ji 11 Îlonê heya 16 yê Îlonê em li malekî man. Gelek guman di serê min de diçûn û dihatin. Em dihizirîn gelo ev mîlîs me nexê dest dijmin em ê kengê ji vir biçin?...Ber êvar bû mîlîs hatin û em ber bi çiyan ve ketin rê de. Ez gelek keyfxweş bûm û hîn bêhtir dema em gihiştin gerîla û bi çavan me ew dîtin. Lê bi rastî tiştek bi min nexweş hat ku ew jî ev bû; gerîla gelek pirsan dikin. “tu ji kû yî? Navê te çi ye? Ji kîjan gundî yî?...” Min hinekî bêhna xwe veda, lê nalînek bergohê min ket. Min temaşekir ku sê heval birîndarin. Di wê tariyê de firmêsk ji çavên min hatin xwarê, hestên min serûbin bû, agir bi dilê min ket. Min di hundirê xwe de got; “gereke ez tola van hevala rakim. Xwîna ku rijandine ez ji cendekên dijmin

8

peyale bi peyale bigrim. Min destê xwe dirêjî riwê xwe kir û firmêskên xwe paqij kir.

Min serê xwe danî ser çenteyê xwe li asîmanan temaşe kir. Stêrk wekî pezekî bêşivan di bedena asîman de diçirûsîn. Çiyayê Cudî jî bi bejn û bala xwe wekî xortekî çardeh salî bû. Qet kalbûn lê nedixuya û ba taybet di wê mehê de xurt bû. Berf zêde nema bû. Tenê di bilindahiya çiyayan de kêmek hebû. Berê ku çivîk û bilbil awazê xwe bi xwunîn dengê “rojbaş hat” em rabûne ser xwe. Piştî xwarin û vexwarinê hevalekî çek anîn û bi me dane nasîn.

-Ev klaşnîkof e.., Ev BKC ye...Ev bisivîng e...

Me çek û rextên xwe girtin. Pratîgî ketin Çiyayê Cudî qada şer. Bi grubek hevalan re em ber bi Çiyayê Cudî ve çûn û li cihekî ku jê re dibêjin “Girê Hirmo” em lê sekinîn. Piştî ku me şevbêrka xwe bihurand, me dest bi xewê kir. Sibehê heval ji xew şiyar bûn. Hevalê Sefkan bi xemginiyekî ku lê diyar bû, rûnişt û wiha ji me re got; “

-Hevalno min xewnek dît. Min dît ku em hemû bi hev re ne. Ken li ser lêvê me ye. Bi hev re yariya dikin. Lê ji nişkêve, mij û dumanek çêbû. Keskesî nabîne...Em tev de li hev kom dibûn û ji her aliyê ve gule wek kevirên agirîn ku ji devê volkanê derkevin bi ser me de dibariya. Min hew xwe nedît destê min li tiştekî germ ket. Heya wê demê min nizanî çi ye… Lê dema ku min destê xwe anî ber çavên xwe, min fêmkir ku rûyê min ji xwîne bibû gol. Ez birîndar diketim. Bi wî şêweyî hevalekî din jî wek wê xewnê, xewnekî dîtibû. Lê belê, şerm dikir ku xewna xwe bibêje. Lê me hemûyan a xwe xiste yek ku bêje û got;

-Gelî hevala ez naxwazim dilê we bi xewna xwe ve bihêlim. Bi kurtayî min didît ku em ketin şer de. Gule li ser çeka min nedima, ji pişt min gulek dihat û di singa min de bi cih dibû. Tişta ku tê bîra min, min çend hevok digotin û min xatirê xwe dixwest. Ez şehît diketim.

Bi rastî jî em ketin nava gumanan de. Me li hev temaşe dikir. Deng ji kesekî derneket. Bêdengiyek sar bû. Hinek

9

hevalan ji ber kela hestan titûna xwe derxistin û cixare li dûv cixarê kişandin. Her çendî ew xewn jî bûn, nedixwestin ku bawer bikin. Piştî ku em bi hev şêwirîn şûna ku em lê diman

me bi cî hişt. Navberêk tê re derbas nebû, dijmin Girê Hõrmo dan ber hawanan. Em wê demê gihiştibûn Sirtê Hasana, beranberî deriyê Dêra Kemalî ê ku li ser deştê ye. Tiştek nebû em bixwun. Saet 12 nîvê şevê bû. Hevala got em ji vir jî biçin. Her kesek ji me meraq dikir, gelo çi heye lê di vê saetê de. Me di cih de amadekariyên xwe kirin û em bi rê ketin. Meşekî dûr û dirêj di bin tava hêyvê de em meşiyan. Te digot qey neşev e. Ez hinekî li pêş hevalan bûm. Tiştekî ku diçirûsî hate ser rûyê min. Min lê niherî ew kêzikekî ku bi şevê ronahiya wan heye bû. Min ji xwe re digot;
-Gelo ev çi dixwaze bibêje. Qey kes li van waran nemaye.
Lewra ew bi xêr hatinê li me dike yan dixwaze bibêje ezê rêka we ronî bikim. Saet pênc û nîvê sibehê bû. Tenê stêrkek dihat xuya. Her çendî di meşa xwe de em bi hişyarî jî tevdigeriyan, lê me nedizanibû ku dijmin derûdora me girtiye. Bêhnekî em sekinîn. Ji nişkê ve dengê çekan hat. Gule wekî ku tovê genim biçinî bi ser me de barandin. Erdêkî rût bû, mirov nikarîbû xwe biparêzî jî. Gelek heval nû bûn. Zêde şer nedîtibûn. Dengek bilind bû û got;
-Xwe bavêjine erdê.
Me hemû ya bi hev re xwe avete erdê. Te digot qey em aşiqê axê bûne û em wê bi çekan radimusin û bi guleyan dixemlînin. Gule ji her hêlî ve dihatin; paş, pêş, çep, rast... Di nava wan de wekî gêja li min hatibû. Min berê xwe da aliyê ku gule ji pişt min ve dihatin. Hîna ez zêde nemeşîbûm. Hevalekî ez girtim û got;
-Bi sekne tu yê bi kû ve biçî?

Min jê re got;
-Ez ê herim cem hevala.
Wî bersiva min da û got;
10
-Ew nehevalin heval Cihat. Ew jî dijminin. Were bi min re be û ji min dûr nekeve.”
Ji her hêlîkî ve pizotê agir dihatin. Her hevalek li cihêkê bûn, li şûnêkî bûn. Barê min hinekî giran bû. Lê dîsa min berxwedan dikir. Me hewil da ku em xwe ji çemberê rizgar bikin. Hinekî em ber bi jor ve çûn hêza me zêde nemabû, û bi taybet piştî ku sê hevalê me li wir şehît ketin. Lê her yekî hevalê me wekî gurê har lê hatibû. Xwîna hevalên şehît bi dest û cilên me ve hişk bibû. Her ku me çav lê dikir, hêrsa me hîn bêhtir zêde dibû. Lê çi bibêjim. Her peqrewanek, her şehîdekî me ku xwîna xwe rijandiye ser vê xaka pîroz, ew ê rojek were û destanê wan ê qehremaniyê were nivisandin. Ew her sê heval qet ji bîra min naçin. Belkî demê ez wan hevokan dibêjim pir bi hêsanî tînim ziman. Lê ew bi kela hinavên min, ji kûrahiya kezebê bi zorê derdikevin. Li milê din, eynî van hevalên ku xewn dibînin, birîndar bûn. Şer giran bû. Guleyê min zêde nemabû. Hevalekî me yê birîndar mabû. Min ew jî dît. Birînê her sê hevala kûr bû, lê dîsa jî bi coşekî mezin dimeşiyan. Hinekî me xwe ji çemberê dûr xistin, hevalekî ji wan zêde nikarîbû bimeşe. Em du heval ketin ber pala wî de û me bi xwe re meşand.
Em gihiştin binya gundekî zêde ne mezin bû. Malên wî kevnare bû. Te digot qey ev sedsale hatiye avakirin. Bênderê kunciyan jî li nêzî gund serê xwe hildabûn. Rewşa hevalên

me yê birîndar ber bi xirabûnê ve diçû. Lewra hevala ku emê hevalê Sefkan di nava bênderên kunciyan de veşêrin. Lê me nepejirand û me got em hinekî din wî derbixin ji ber ku şopa xwînê li dûv me diyar bû. Saet bibû sisê û nîvê şevê. Yan emê xwe ji wir dûr bixin yan jî şehadet li benda me hemûyan e. Di wê navberê de ez li ber pala hevalê Sefkan de bûm. Bi deng nizmiyekî bi hev re diaxifîn. Her çendî gelek xwîn ji canê wî çûbû, lê dîsa jî dixwest bi min re riya xwe bidomîne. Lê zêde nema dikarîbû. Lewra me ew li şûnekî veşart û du bombe danê. Lê wî xwest ku ez pê re bimînim. Hevalan ji min pirsî, çima hevalê Sefkan vê daxwaziyê ji min dike. Bi

11

rastî min nizanîbû çi bersivê bidim? Lewra min got; “ez û hevalê Sefkan du rûpelê gulekî ne. Dergehê şarêkî ne. Ava çem û rûbarekî ne. Du tîpên navêkî ne. Giyanek û du bedenin. Du dilopê ava kaniyekî ne. Du firmêskên çavekî ne. Lê dîsa jî em hevalê hevûdu ne.” Min jî xwest ku ez li cem wî bimînim. Lê hevala nepejirand û me ew bi cî hişt û me rêka xwe domand. Şefaqa sibehê diyar bû. Zerîqeyên rojê hêdî hêdî ji ser çiyan ve derdiketin. Em jî mecbûr man ku em xwe ji ber çavan veşêrin. Di nava daran de me xwe veşart. Heya êvarê me ne av, ne cixare vexwar. Ji bo ku em xwe xilas bikin, aramiyekî gelek mezin dihat xwestin. Ez bi vê sekname zêde neêşiyam. Tişta ku ez pê êşiyam ew bû ku hevalekî birîndar bi me re bû. Lê qet jê deng derneket. Te digot qey, ew birîn di canê wî de nînin. Min bi dengekî nizim jê pirsî;

-Heval ma qey tu naêşî?

Ewî wiha bersiv da min û got;
-Hevalê Cihat birîna min gelekî diêşê. Lê dema ku ez li wê temaşe dikim ez jibîr dikim.
Şivanên ku nêzî me bûn, berê xwe dan gund. Êvarê perdên xwe yê reş li ser gerdûnê ve berda. Hêdî hêdî em bendewarê wê bûn. Belkî ji bo gelekan şev tê wateya tarîtiya jiyanê ango mirina bi lez, lê ji bo me şev mizgîniya hebûnê ye. Me bi baskên teyrekî şikestî, şalûrekî bêziman ew hembêz kir. Ji ber ku şev kirasê gerîla ye û tê de her şahî û kêfa xwe dike. Ew şer, şerê min ê yekemîn bû. Ji bo min, bû ezmûna herî mezin di jiyana gerîla de.
12
MİRİNÊ HER KÊLÎ
SİLAV DİDA!
“Ji hevalan qutbûn, perçekî ji dilê min qut dikir. Gihiştina çiya û refê gerîla xewna min a pêkhatî bû. Lê nexweşiya bêbext bi suwarbûna kêleka li ser Çemê Dîcle re hêdî hêdî ez ji hevalan dûr dikirin.”
Di nava her mercî de, di nava serma û seqema deşt û zozanên welatê agir û rojê de, mîna berfîna serî ji nava berfê hildidin û rû didin tava pîroz. Bav û kalên wan xwe di nava wan çiyayan de dîtin, hîn jî nifşên wan li van çiyan, bi navê gerîla ji bo mafê netewa xwe a çewsawe têdikoşin.
Hogir jî yek ji wan gerîlaya ne. Ew tenê dixwaze serpêhatiyekî bilêv bike. Ew ê me ji Çiyayê Gabarê ber bi şarên bav û kalan ve bibe.
Di payîza 1990’an de em li Çiyayê Gabarê bûn. Wê çaxê ez taze tevlî refên gerîla bibûm. Mixabin, hîn demek

dirêj derbas nebibû, ji ber sermayê ez nexweş ketim. Sermaya wê salê li Çiyayê Gabarê heya niha di bîra min de ye. Di nava bêderfetiyeke pir giran de hevalan jiyana li çiya hembêz dikirin. Tişta ku heya niha mîna dîmenekî li ber çavê min e, sipîbûna pişta hevala ye! Gava em li ber agir rûdiniştin, rû û singên me gerim dibû, lê pişta me tevan mîna deşta nim girtî, ji xusiyê sipî dikir. Ev mercên ku bi mehan dirêj dikir, hişt ku nexweşiya min, min ji çiya yên Kurdistan û bi taybet jî ji Gabarê dûr bixe. Ji ber giranbûna nexweşiyê,
13
hevalan biryara şandina min a cem bijîjşk dan. Devara ku ez ê bibam rêwiyê reya wê, Cizira Botan bû.
Edî katjimêrên ji hev veqetînê hatibû. Piştî amadekariyê em hatin li axa Çemê Dicle sekinîn. Ji bo ku em bigihiştan Cizirê, pêwist bû ku em çem derbas bikin. Katjimêrên dawî ên sala 1990'an bû. Ji ber ku ew şeva sersalê bû, hevalan em hişyar kirin.
"Heval, leşker van rojan li Cizirê pir digerin. Çend roj berê du heval şehît xistin. Hûn şiyar bin û hay ji xwe hebin. Hûn serkeftî biçin."
Ji hevalan qutbûn, parçekî ji dilê min qut dikir. Gihiştina çiya û refê gêrîla xewna min a pêkhatî bû. Lê nexweşiya bêbêxt, bi siwarbûna keleka li ser Çemê Dicle re, hêdî hêdî ez ji hevalan dûr dikirim.
Li paş demekî kurt, bi silavdayîna milîsan re, roja tevlîbûna min a li refê gerîla hat bîra min. Lê ev car berovajî bû. Ew silav, nîşana ji hevalan dûrbûyînê bû! Silava gihiştina Cizîra Bota bû. Bi rêberiya wan herdû milîsan em gihan

gundekî Cizîrê ê bi navê “Deşta Darê!” Li wir heval Yusuf li pêşwaziya me bû. Heval Yusuf wê demê rêvebirê wê herêmê bû. Gundê Deşta Darê ji ber ku di hêla ewlekariyê de baş bû, hevalan em li wir bi cih kirin. Lê mayîna me ya li wir hinekî dirêj kir. Ji ber ku mercên tîmarkirinê li Cizîrê ne zêde baş bû, hevalan berê me dan Misêbînê. Lê, mayîna me ya bîst rojan li Cizirê bandorekê mezin li ser min hişt. Her rojek dûrbûyîna min ji hevalan, li ber min mîna mehekî bû. Tenê dilsozî û girêdana welatparêzên Deşta Darê, dihişt ku em zêde bi tenêbûnê nehisin. Bi hilîna roja bîstan ji mayîna me a li Deşta Darê, me xwe ji bo çûnê amade kir. Bi hatina êvarê re, bozinga ku tangêra avê hildigirt, hat ber deriyê mala em lê bûn. Ji bo gihiştina Misêbînê em neçarbûn ku têkevin tangêra avê de. Li paş xatirxwestinê em ketin hundirê tangêrê de û derî bi mifteyan asê kirin. Tangêra ku nîv metire av tê de bû, ewqas cemidî bû ku mîna berfaqerisî li me dihat. Gava em rudiniştin, av dighişt singa me. Lê serma û seqema

14

hundirê tangêrê li hêlekî bû û hizirîna me li ser rû bi rû mayîna bi dijmin re, li hêlek din bû. Ji bo tedbira ku bi dijmin re hatina rû bi rû yê, me sîlahên xwe jî rakiribûn û di hundirê tangêra qerisî de, me wan dabû ber hembêza xwe, mîna dayîka ku zaroka xwe hilgire û nehêlê tu êşê bibîne, me çekên xwe bi meşa bozingê re hişk hembêz dikir.

Piştî çend katjimêran, bozing rawestiya. Ew sekna wê, nîşana gihiştina cî bû. Bii sekna bozingê re, dengê deriyê bi birxuya (vîda) hatibû kilîtkirin, hat. Bi dengê şifêrê bozingê re, me daxwe;

“Heval em gihiştin, derkevin!”
Piştî çend saetan ji nedîtina rojê, em derketin derve.
Heya em gihiştin wir, roj ber bi ava bû. Te digot qey, kincên me bûne ewrên payîzê, wisa av jê dinuqitî. Bi derketina ji tangêre, gundiyê li cem me, di cih de kincên me yê şilo pilo bûyî, bi yên zuha re gûhertin. Bi pirsa xwe re me navê gundê ku em li wir bûn, fêrbûn.
“Navê gundê we çi ye?”
“Zorava ye. Gundê Mala Egidê Qaso ye heval.”
Gelê welatparêz ên Zorava bi dilgermî û pêşwaziya xwe tevahî êşên nexweşiya min, ji bîra min bir. Her çendî herdû hevalên ku ji Kongra Partiyê hatibûn dipeyîvîn, lê dîsa jî min xwe li ber gotin û girêdana van welatparêzan bi partiyê re, biçûk didît. Min bi van welatparêza û başiyên wan, rastiya gelê xwe ê Kurd hîn bêhtir dinasî.
Li dûv rojekî em ji Zorava veqetiyan û derbasî Gundê Qurdîsê yê girêdayî Misêybîn ê bûn. Her çend Zorava li paş me ma jî, lê weke masiyê ku li tûra nêçirvanekî bisekine, wisa Zorava di dilê min de bi cih bû. Vê carê ez ji herdu havalên ku ji roja yekem a rêwitiyê bi hev re bûn, veqetiyam û bi tenê li gund mam. Piştî ku hevalê Kemal ê rêvebirê navçeyê, çek û rextên me wergirt, ji min re got;
“Heval Hogir! Tu li vir be. Dema ku me rewş guncaw dît, em ê te rêbikin nik bijîjşk.”
15
Ew cara yekem bû ku ez bi tena serê xwe li nav gel dimam. Gundê Qurdîsê jî ev tenê mayîna min hembêz dikir. Ew gund bi giştî û bi taybet mala Hemîd ku ez lê dimam, ne

tenê heval, eskerên dijmin jî pir dihatinê de. Di wê demê de ger çûn û hatina hevalan li deverekî zêde ba, dihişt ku çûn û hatina dijmin jî pir be. Gundê Qurdîsê jî rewşa wê wisa bû.!
Ez 5 rojan li wir, li mala Hemîd mam. Lê ji ber ku hatina havalan dereng ma, min lawê malê rê kir nik wan. Her di wê rojê de hevalan xeber da ku ez dikarim biçim cem dixtor. Ji bo ewlekariyê jî Hemîdê xwediyê malê nasnama lawê xwe da min. Tevî ku wêne yê li ser nasnamê nedişibihî min, lê ji tinebûnê, baştir bû. Bi vî şeweyî ez roja din çûm Qiziltepe ji bo tîmarkirina xwe. Lê dixtor li şûna emeliyatkirina mîda min, hinek derman da û got;
"Ger bi dermanan baş nebe, em ê pişt re emeliyat bikin."
Nêzîkbûna ku dixtor kir, diyar bû ku welatparêz e.
Lê çûna cem dixtor û nexweşiya min li hêlekî, dîtina ewqas leşker ku li hin deran jii mirovan pirtir bûn, li hêlek din bû. Min bi gera xwe gelek cihên leşker lê radiwestin nasî. Di wê gerê de gelek tişt ketin bîra min. Yek ji wan; ji bo êrîşkirina li ser Mêrdinê, min ji nêz ve qereqol û cihê wan nasîn. Di nava ewqas esker de bêguman tirsa girtinê û nasînê jî li ba min çê dibû. Lê bêyî ku tu pirisgirêk rû bide, bi erebeya gûnd, piştî em gihiştin Mêrdinê, em vegeriyan gundê ku em jê hatibûn. Lê ji ber ku xwediyê erebê ez nasîm û ji ber ku hîn roj bû, bi armanca kes min nebîne, ez birim mala xwe. Tevî ku xwediyê erebê li ser welat û zora dijmin dipeyivî jî, min xwe neda nasîn. Bi hatina êvarê re, wî ez dîsa birim mala Hemîd.
Malbata Hemîd ji du law û çar qîzan pêk dihat. Bi rastî jî min mal weke wê nedîtibûn. Gava ez gihiştim weke ku

endamekê malê piştî demek dirêj vegere wisa keyfxweşbûn. Ez çiqas li ser wê malê bêjim jî, wê nebes be, tenê dibêjim di koşeya herî binirx a dilê min de cî girtine. Min pênc roja li wir jiyan kir, lê min rojekî xwe biyanî hisnekir. Ji bo vê yekê
16
tişta ji destê min dihat, min dikir, tenê ji bo mal ji destê dijmin tu êşê nekişîne. Lê mayîna min li wir roja dehan jî dagirt. Lê belê jixwe nêzîkatiya wan ji min re ewqas germ û baş bû, ez êdî li hember wan xwe hertim deyndar hîsdikir. Hemû tiştê xwe ji bo xatirê me feda dikirin. Ji bo parastina hevalan û bi cî anîna erkên xwe yê welatparaziyê, gelek caran mirin jî digirtin ber çavan. Ger ez bêjim wan çend rojên min ê li mala Hemît welatparêziya rasteqîn bi min da naskirin, wê neşaş be. Her endameke malê te digot qey erkekî wî ê welatperweriyê heye, wisa bi fedakarî dixebitîn. Min gelek caran ji xwe digot, ger dijmin were gund gelo malbata Hemît bi taybet û malên gund bi tevahî wê çi bikin? Hevalan gelek caran qala welatparêziya gel kiribû. Min ew rastî tenê bi gotinan bihîstibû û naskiribû. Lê, mayîna min ê çend rojan di nava gel de ev rastî bi zelalî ji min re da nîşan-dan. Wê çaxê gotina bav û kalên me ket bîra min; “Ger Kurd, bi çavên xwe nebîne, bawernake.” Lê ê min ji hêlekî bi gotin ji hêla din ve bi çavên xwe jî min dît.
Tevî ewqas parastina xwe, rojekî serê sibehê ez bi dengê reyîna kuçikan şiyar bûm. Wê gavê xwediyê malê, ez hişyar kirim.
“Heval, eskeran dora gund girtine. Wê li malan bigerin!”
Wê çaxê min ji xwe re got ku; xebera mayina min a li

gund gihiştiye dewletê. Bii tirsa hatina eskeran re min û xwediyê malê nîqaş kir. Em destpêkê gihiştin biryara ku ger esker werin hundir em ê bigrin. Lê me ev nêrîn gûhert û min kincên lawê malê “Delîl” ku şivantî dikir (Niha di nav gerîla de ye) li xwe kir û ketim nav pez de. Piştî ku min dît esker nehatin şûna mayîna min, bi armanca ji gund dûrketinê min pez derxist çolê.
Lê hîn ez ji gund derbas nebibûm, eskerek hat pêşiya min û got;
“Hê, çoban (şivan) vegere gund. Kontirolkirina nasnaman heye.”
17

Wê çaxê min hinekî cesaret girt. Ji ber ku wî ez şivan nasîm. Min bi tirkî fêm dikir lê bi kurdî min bersiva wî da:
“Ez venagerim.”
Lê piştî wî sîlaha xwe xist nava min, min ew tehv da paş. Dema min ev yek kir, jii jor çend eskerên din hatin, wê çaxê ji bo ku ez newim nasîn, min berê xwe careke din da gund. Hecî lawê Hemîd bû. Ji ber ku wê demê wî karê milîstiyê di-kir, ew hatibû naskirin. Vê yekê hişt ku di wê rojê de were girtin. Di nava vê rewşî de tevî ku min ji xwediyê malê xwest ku min derbasî malekî din bike jî, lê wî nepejirand;
“Tu ji mala min dernakevî!”
Ew mal pir ji hêla hevalan ve hatibû bikaranîn. Ji ber vê yekê, her cara ku esker hatibana gund, dihatin wir. Dema ku eskeran li derî xist ez li ser piştê vezelandî bûm. Ji bo min nenasin ez li gel zarokan bi heftokan mijul dibûm. Gava

esker silav da ez ji şûna xwe ranebûm. Wî got;
“Ma mirov wisa nêzî mêvanan dibe?” Lê xwediyê malê dest bi axaftinê kir:
“Ew zêde fêm nake, mîna dîna ye.”
Tevî ku vê gotinê zora min bir jî, lê ji bo parastina min bû. Esker ku asta wî sûbay bû, pirsî:
“Lawê te ê dîn bênasname bû, ma a vî jî nîn e?”
Wê çaxê xwediyê malê ji min re got;
“Kimlîkê bidyê de.”
Dema sûbay li nasnamê û wêneyê wê nêrî, serî hejand û got;
“Ev ne a te ye. Lê bila a te be!”
Û ji xwediyê malê re got;
“Bila bi me re derkeve nav gund.”
“Ew zêde fêmnake bila lawê min ê din bi we re bigere.”
“Wê çaxê bila bi me re li mala xwe bigere.”
Ez neçarbûm ku bi wan re li mala ez lê dimam bigerim. Piştî gera li malê bi dawî bû, esker çûn malên din geriyan. Lê wekê min li jor got; piştî ji malê derketin, lawê malê heval Hecî girtin. Vê yekê hişt ku jin û zarokên gund bi eskeran re
18

bikevin nava şerê bi dar û qoskan. Piştî pevçûnek dirêj şazdeh esker û albayek birîndar bûn. Erebeyên wan bêcam mabûn hingî kevir lê ketibûn. Lê mixabin heval Hecî ji nava destê wan nehat derxistin. Piştî bîst û pênc rojan ji îşkence û şaş mehên hepsê, hevalê Hecî tu tiştî nabêje. Ji ber ku dijmin tu tişt jê nagire, xwestin wî di rêya qontir gerîla re, bikujin.

Dema ew ji hepsê dibirin reya mirinê, heval Hecî xwe davêje dolekî li rexê rê û di bin kevirekî de xwe vedişêre. Lê ew dîsa ji hêla eskeran ve li wir tê girtin.
Hemîdê bavê heval Hecî piştî çûna eskeran got;
“Hecî hat girtin tişt nabe, tenê başe tu nehatî girtin.”
Ev peyva wî mîna morekî ku tu car winda nabe, li ser dilê min şûna xwe çêkir. Tevî ku lawê wî û zarokên wî tevan ewqas îşkence dîtin, hîn jî ji ber neişkerebûna min keyfxweş bû. Vê yekê peyvên ku li jor li ser welatparêziya gelê me digot baştir ronî kir. Mirov gelek caran dibe şahîdê gelek bûyeran. Lê tişta herî mezin ew e ku ew bûyer bi ser min bi xwe re derbas bû. Ji ber vê yekê ew mayîna min û gotinên bavê heval Hecî bûne xwedî cihekî hîn taybettir di dilê min de.(Piştî wê rojê min pir caran dixwest ku car din biçim mala heval Hemît. Mixabin, çûna min negengaz bû. Ji ber ku malbata Hemît tev de tevlî refê partiyê bibûn. Lawê wî ê ku min nasnama wî hilgirtibû di zindanê de, ji ber îşkencê şehît ket. Ên din jî tev di nav gerîla de cih digrin.)
Vegotin: Heval Hogir
19

11 STÊRKÊN ASÎMANA
WELATÊ ME
“Tu car zarokên rojê tîrêjên ku ji axê re dibûn çavkaniya behremê, ji bîr nedikirin. Jibîrkirin di qanûna şoreşgertiyê de tune ye.”
Jiyan careke din di bihara 91 an de vedijiya. Bihara gul û kulîlka jiyanê ye, bihara ku senfoniya sulav û lîlava ye, bi

ahenga meşa gerîla ve bibû yek can û rih…Çûk û bilbil bi dengê xwe yê bêhempa re ji gerîla re dibû xelata heviyê…Welatê minê xweşik û bêhempa bi wateyeke cuda ve pêşwaziya gerîla dibû. Bi ew xwezaya xwe ya tije raz û nepenî re rê ji jiyana azad re vedikir.
Ew bedewa nazik û zirav ji ber zordarên dil hesin tim û tim dinalî, niha bi rûkenî dilên xwe yê şikestî bi stêrkên azadiyê re şa dike. Çav şil, dil honik bibû. Ew şilî şiliya heviya ku sed hezaran salan binax bibû tê. Bi zarokên rojê re keziyên rojên azad dihat hûnandin. Her diçû kezî zêde dibûn. Her hûnandina gisûyek, dibû kêliyek dîrokî..Her tayek porê axa nazik bi êş bû, lewra hûnandina wê jî ewqas bi jan dibû. Lê, ew rûken û dilşa bû. Zarokên rojê, li derûdora wê kombûne û bi baldarî hêdî hêdî keziyên wê şeh dikin û dihûnandin. Bi hatina biharê re xweşikbûna axa şêrîn, hîn bi zelalî dixuya. Çiyayên wê yê bilind û asê bi keskayî ve dixemiliya…Di dengê çem û sulava de awaza dengê hezîn ya dîroka birîndar dihat. Bilbil dengê xwe yê ku stranên dîroka wenda digot, li ser asîmanan dixist. Stêrkên şewqdar bi hemû delalî û xweşikbûna xwe re mirov cezb dikirin.
20

Erê, bihara welatê min a bi navê xwe yê şêrîn Kurdistan, weke keskesoreke reng bi reng û di her rengê xwe de jî wetaya hemû hebûnan vedişart. Comerd û dilnizme xwezaya welatê min. Raza wê ji bêdawîbûna wê tê. Gerîla hevkarê vê xwezaya bêpênase ye. Ew ji deng û awaza wê re heval in. Ew çavên wê yê tarî re çirûskên jiyanê ne. Êş, jan, şadî û

coşî ya wan wekhev in. Her yek gerîla bibû parçeyek vê axê. Dilê wan ê fireh li her derê vê axê diavêt. Ew zeman û cih derbas dikirin. Jixwe di nav vê xweşikbûnê de, ne mimkûne ku dil teng, hebûn bi sînor be.

Ez di wê di dema vejîna bihara nû de, li Bestayê bûm û li meskenê mîr û began dibûm şahîdê zayîna jiyaneke nû. Kela axa şêrîn bi coşa zarokên rojê re bilind bibû. Kela germa rojê bandor li zarokên xwe, zarok li axên xwe, ax jî roj û zarokan re dikir. Şerê hêvî û azadiyê gihiştibû asta herî bilind. Hestên serkeftinê divejiya, pêlên şoreşê li her derî welat belav bibû. Botan û eyaletên din tola hezar salan hildidan. Bi zanebûna rastiya dîrokê ve û bi dahûrandina tiştên paşverû re ku hiştine her tim binkeftin bibe para Kurdan, tevgerek û xebatekî mezin û nû roj bi roj li herderî welat wekî lehiyekî diherikî.

Zarokên rojê bi baldarî kom bibûn û bi pênûsên xwe yê bijarte re rûpelên dîrokê dinivisandin. Biryarên girîng û zehmet digirtin. Xweydana ku ji bedenên wan diherikî, ji pênûsên wan re dibû murekeb. Kombûyînekî giran û girîng, civînekî dîrokî dest pê kiribû. Kongreya çara ya gerîla, pêkdihat. Biryarên dîrokî û jiyanî dihatin girtin. Ji bo vejîna jiyana Kurd û rizgariya axa bedew, pêwîst bû ku li her derê welat şer hîn bi xurtir û berfirehtir bidomiya. Herêmên ku naskirina gerîla zêde pêknehatibûn, diviya ku bihata nasîn û li wan herêman jî gerîla bi cih bibûya. Herêmên stratejîk bi lez û bez pêwîst bû ku bihata girtin. Kêlî bi kêlî gerîla keziyên jiyanê dihonand. Kêlî tu car kêm û kurtiyan nediperjirand. Ji ber vê yekê jî her gavek ku dihate avêtin,

gelek hessas bû. Heyecana vê berpirsiyartiya dîrokî dilê
21

hemû hevalan hildipekand. Dengê dilên ku bi coş û peroşmendiyekî mezin diavêt, li her derî welat wekî senfoniya rizgariyê deng dida.
Edî, kêliyê tevgerdariyê hatibû. Gerîla li hemû hereman belav dibû. Herêmên stratejîk, diviya ku di destpêk de werin girtin. Herêma Garzanê jî yek ji van herêmên stratejîk bû. Herêm, di navbera eyaleta Botan û Amedê de ye û milekî wî jî digihije Serhedê. Partî ji bo ketina vê herêmê hîn di sala 1985 an de biryar girtibû. Qerargeh li Sasonê wê bihata avakirin. Ji ber ku Garzan wekî me diyar kir, cihekî stratejîk û di nav herêmên din de reya derbasbûyînê ye. Ew, wekî dilê Bakur e. Rê divê sêkujê de digihijin hev. Ew hem niqta dîdariya rêyan hem jî niqta dîdariya rêya dirokê ye jî. Girîngiya Garzanê di dîrokê de jî gelek mihîm e. Ew, dergûştî ji raperînên dîrokî re jî kiriye. Gelek qehremanên veşartî di bin axa Garzanê de bi hêviya tolhildana dîrokî jan dikşînin. Rewşa wî ya stratejîk hiştiye ku dijmin jî vê herêmê bi lez nasbike û siyaseta xwe ya qirêj pêkbîne. Gelê Garzanê ji ber raperînên dîrokî hem welatparêz e û hem jî ji ber ku dijmin jî girîngiya vê herêmê di wextê xwe de fêmkiriye, pê re leyîstiye û li hember hest û nêzikatiyên welatparêzî, ajantî û koricitî pêşxistiye. Yanê di aliyekî de ajantî û koricitî, di aliyekî de jî welatparêzî li vê herêmê bi cih bûye. Ji ber vê yekê jî li herêmê cihbûyîna gerîla, gelek caran li gorî ku dihat xwestin pêknehati bû. Gelek caran gerîla hewildaye ku

bikeve vê herêmê, lê hem ji erdnigariya herêmê re biyanî bûn û hem jî ji gelê herêmê re biyanî bûn hiştiye ku gerîla vê herêmê baş nasneke. Bi jiyaneke eşirtî jiyankirin hişt ku, ger cihekî gerîla nas bike, gelê wê cihê jî tev de gerîla nas bikin û alîkarbin, ger ciheke ku gerîla nasneke, gelê wê cihê jî tev de gerîla nasnekin û bibin alîgirê dijmin.
Eşirê Xerzî li vê heremê jiyan dikin û herêm navê xwe ji navê vê eşirê girtiye. Dîsa ev sêkuj bûye şahîdê raperînê wekî Eliyê Yunus. Kela Yunusa (Kelenûs)ku navê xwe ji rewşa xwe yê dişibe kalê girtiye, di herêmê de hîn jî di
22

navbera sêkuja Baykan-Motkî-Kozluk de girekî stratejîk e. Wekî dîroka xwe asê û tenê têketanekê wî heye. Bi vî awayî jî wekî kalekî sirûştî ye. Di derdorê vê de eşirê Xerzî jiyan dikin. Gerîla belkî ji vê herêmê re biyanî bû, belkî li gorî dihat xwestin bi awayekî berfireh li vê derê cih negirtibû, lê hêviya rizgariyê, girêdayiya axê û hestên ponijîn, li hember gelek wendabûn û şehîdbûnan re dîsa jî têkoşîna gerîla ku li vê herêma zor û zehmet bi cih bibe, berdewam kir. Li hember hemû astengî û keleman, têkoşîn domandin û heviya xwe tu car neşikênandin pîvanekî gerîla û şoreşgeriyê bû. Erê gerîla bi biryarên xwe yê dîrokî re dîsa berê xwe dabû “an serkeftin an serkeftinê.” Dirûşma jiyana gerîla serkeftin û tolhildan bû. Bi dawîbûna kongra çaremîn û bi amadekirina yekîneyên ku wê biçûyana Xerzanê heyameke nû vedibû. Tola heval Numan û hevalên din ku deşta Bismilê bi îxaneta rûreş re hatin şehîd kirin wê bi hata hilanîn. Tu car

zarokên rojê tîrêjên ku ji axê re dibûn çavkaniya berhemê, jibîr nedikirin. Jibîrkirin di qanuna şoreşgertiyê de tune ye. Mereto çiqas bi înat û asê be, gerîla jî ewqas wekî xeta asoyekî xwedî sebr û heviyekî bêdawî bû. Wekî Şêx Cuma ya ku di geliyekî kûr de bêsekin diherikî û bi herîkîna xwe yê nazdar ve çawa bi Ava Sason, pişt re Ava Botan û pişt re jî delaliya malê Ava Dîcle re yek dibû, gerîla jî dixwest ku xwîna ku li ser van axan hatiye rijandin bike yek av. Perçebûyîna hezar salan kom bike û nirxên belabûyî bîne cem hev. Ji çemên bêdeng, çiyayên bêaso re bibe deng û aso. Gerîla, heviya çêmên nazdar, gelî û deştên bêberhem re toxima jiyanê, niha berê xwe dide Xerzana dilşewat û jê re wê bibe dermana hezar salan. Xayîntî û îxaneta ku di nav xwe de wekî “kurmên daran” vedişêre jibîrnake û li hember çembera îxanetê, çembereke ji ronahî û çirûskên agirê çêdikî û baweriya xwe bi vê çembera ronak tînî. Du yekîne, du yekîneyê xwedî çembera ronak, derdiketin rê. Yekîneyekî di bin fermandariya heval Mervan, yekîneyekî jî di bin fermandariya heval Xeyrî û Mizgîn hatibû amadekirin. Her
23

hevalekî ku di nav van yekîneyan de cih digirt, bijarte bûn. Ji ber peywireke ku dabûn ser milê van yekîneyan, peywireke dîrokî bû. Edî tu asteng û kelem li hember neketina û nebicihbûyîna vê herêmê re nedikarî bibe pêwîstek. Heyama nû û biryarên ku hatibûn girtin, tu pêwîstek nedipejirand. Di nav vê mêşa dîrokî de, cih girtina min, şensekî girîng bû. Ew şensa ku derfeta naskirina gelek hevalên nemir dabû

min, di jiyana min de jî cihekî cuda digire û wekî şervanekî di yekîneya heval Mervan de cihê xwe digirtim.
Di nav çavên her hevalekî de wateyeke gelek cuda dihat dîtin. Di çirûskên çavan de dîmena dibey qey her hevalekî ketiye nav xebata neqişkirina bingeha rizgariyê, diyar dibû. Di meşa me de astenga yekem ku derket pêşiya me, derbaskirina çema ku bi ava baranê re gur bûye û diherike bû. Lê belê derbasbûyîna li ser vê avê, me gelek dida fikrandin. Emê çawa bikin, ji ku derê bi çi rengî derbas bi-bin?.. Av gelek gûr bû, ne mimkun bû ku em bi destê hev girtin an jî bi ben girtinê re derbas bibin. Diviya ku em di ser pirê de derbas bibin. Lê belê pira heyî jî, ji aliyê dijmin ve hatibû girtin. Derbasbûyîna me li ser pirê îhtîmala dîmendayînê mezin dikir. Lewra ji ber ku me herêm naz nedikir, vebirjarka me yê em di reyeke cûda de meşa xwe berdewam bikin jî tunebû. Bi zor û zehmetî, bi wendabûn û rîskan re emê herêm nasbikiran. Ji vê yekê jî derdorê naskirin, cihê ku careke ji wir derbasbûn wir baş naskirin û keşif kirin ji bo me gelek girîng bû. Heval hemû bi baldarî li derûdorên xwe dinêriyan. Pişt re me biryara, ji ser pirê derbas bin girt. Me bi baldarî û bi rîskên mezin re hedî hêdî bi mesafe mesafe dest bi derbasbûnê kir. Heval Mervan bi werektiyeke û bi berpirsiyartiyeke girîng, yek bi yek me ji ser pirê derbas kir. Destê me li ser tetîkê, çavên me li derdorê bû. Heyecaneke mezin û bi vê heyecanê re jî cîddiyeteke mezin me jiyan dikir. Dema ku me li hev dinêriya hiskirin û hevalbendî ya di navbera me de weke behrek e kûr û bêdawî di çavên me de dixuya. Di encam de me ew kêliyên bi

ponijîn, bi alîkariya heval Mervan re derbas kirin û meş berdewam kir. Lê belê, nenaskirina herêmê, meşê hêdî dikir. Li rastê çi werin, wê çi were jiyandin nediyar bû. Çav hişyar, rih di nava heviyê de bû. Hema di her kêliyê de wê çi biba nedihat zanîn.
Mereto, Kurîs-Kember-Sîser, Zoveser bêdeng, hatina me temaşe dikirin. Di bey qey ew jî, nexwestina me yê beriya ku em li herêmê bi cih bibin rastî dijmin werin û ketina me yê herêmê dijmin bihese, fêmdikirin û bêdeng diman. Rêzeçiyayên Kurîs-Kember-Sîser, bi tecrûbeyên xwe yê bedelgiran re dixwestin raman û hêza gerîla re bibin ronak. Ew jî hêviya dilê xwe di nav bêdengiya bi raz de vedişartin. Sîser –ku ji birû heta erçena xwe rûyê wî di şerê navbera wî û xwişka wî Kember de, bi kêr lêxistina Kember ve hatiye birîndar kirin, bûye geliyekî û rê ji bendava Sîser re vedike- ji zarokên rojê re ji bo ku bibe war û cî di nav hêviyekî de bû. Kember -ku sitûyê wê ji hêla Sîser ve piştî ku Kember rûyê wî bi kêrê diqelişîne sîrkut li serê wê dixe û sitûyê wê dikeve nav bedena wê- wekî rêzeçiyayekî bêsitû hatina gerîla silav dikir. Kurîs jî –ku birayê navîn e, di şerê navbera Kember û Sîser êdî nema şerê xwişk û birayê xwe re tehamûl dike û dikeve navbera wan. Lê belê piştî ku bi nifrînên diya xwe re ku hemû di cih de dibin çiya -bi ciwanbûn û xweşikbûna xwe re bala gêrîla dikşîne. Sîser di aliyê başûr de bi ew geliyê ku ji bendavê wî heta jêrê cihê kêra Kember nîşan dide, bilind dibe. Di aliyê bakur de Kember bêstû ku

nîşaneya cihê sîrkûta Sîser e, xuya dibe. Di navîn de jî Kurîs hildikşe asîmanan. Erê, bakur, başûr û di navîna Xerzanê de ev hersê çiya dîmenekî cuda dide vê herêmê.
Meşa me di aliyê Şêrwanê de berdewam dikir. Bi rastî jî ev der cihekî gelek dîrokî û stratejîk bû. Dema ku me, Çiyayê Mêrgelo ya ku dikeve başurê rêhevrîşmê, dît, em gihiştin wê qeneatê ku, tu gotin û peyv nikare xweşikayiya vir pênase bike. Bi daristana xwe yê mezin û bi kaniyên xwe yê bêhempa re çiyayekî gelek xweşik bû. Me ji van
25

xweşikayiyan hezeke mezin digirt. Coş û heyecana me her diçû zêde dibû. Lê belê ji ber ku dijmin tedbîrê xwe bigre beriya me ketibû herêmê û di gelek cihan de jehra xwe vala kiribû û gelek gelê vê herêmê xistibû bin bandora xwe. Ji ber vê yekê jî em di tevgereke gelek bi xeternak de bûn.
Koricitî di sala 1985 an de ewil di Şêrwan û Mutkê de bi awayekî veşartî dest pê kiribû. 1987 an de bi awayekî fermî ev leystoka dijmin li herêmê cih girt. Dijmin li herêmê zêdetir dest avêtiye qelhên ku bi eşirtî jiyan dikin û çiyayî ne. Gelek qelh piştî raperînên ku li herêmê çêbûne û hatine perçixandin, xwe ji bajêr û tekiliyên derûdor qut kirine û bêhayê cihanê jiyan dikirine. Sala 1985 an de grubek hevalên me dikevin vê herêmê, lê belê ji ber ku bi gelê herêmê re bi awayekî germ û kûr nakevin têkiliyê û baş xwe nadin nasîn, hin qelh ji me ditirsin û di wê demê de dijminê ku dixwest li wir bi cih bibe vê derfetê ji xwe re weke firsendekî dibîne û dide şixulandin. Li vê herêmê di aliyekî de qelhekî bi vî ren-

gî heye, di aliyekî de jî qelhekî ku bi awayekî hestên waletparêzî re bi me re ketine têkiliyê û alîgirên me ne jî hene. Zêdetir koçer di vê herêmê de piştgirên me yê herî girîng bûn. Gelê vir, hem ji ber raperînan û ji ber şerê navbera eşîran, bi awayekî şerker mezin bûne û şerker in. Lê belê bandorên xisusiyetên eşîrtî ku kî bi hêz be û kî bi bandor be dibin alîgirê wî, di aliyê şerê netewî de astengbûyîna xwe li vê herêmê jî bi vî rengî diyar dikir. Encax nezanîna li vê herêmê kî-kî ye û çawa ye, dihişt ku em bi xeternak û şayîş bin. Dijmin ketina me yê herêmê hesiya bû û ji tirsa gerîla li vê herêmê bi cih bibe re ketibû nav tevgerê. Agahî bi çi şêweyê dihişt dijmin kêm-zêde hêdî hêdî me naskiribû. Lê hîn jî pirsgirekê me yê hînbûyîn û naskirina herêmê hebû. Kî koriciye, kî welatparêz û alîgir e, me hêdî hêdî dinasî. Her ku roj derbas dibû, me di herêmê de cihên nû keşif dikir. Mergelo di aliyê cihgirtina me yê Şêrwanê de cihê me yê destpêkê bû. Ew kaniyên wî yê bêpênase hîn jî di hiş û bîra min de ye. Kaniya Mara ku navê
26

xwe ji rastiya xwe girtibû, wekî efsaneyê ku li ser dihat gotin nepenî bû. Li gorî ku dihat gotin; mar di dema cotbûna xwe de tên ser vê kaniyê û piştî cotbûnê, xwe li ser vê kaniyê dişon. Bi rastî jî, li ser vê kaniyê gelek mar hebûn û mirov digot qey ev der cih û warê wan e. Dîsa ew kaniya wê ya bi navê Birgê, li gorî gotinan ev kanî ku ji latekî derdikeve -bi lexistina birûskekî re diderize û ji vê derizandinê av havînan wekî cemedê sar, zivistanan jî şiregermê tê- mirov efsûn di-

kir, nayê jibîr kirin. Ger erdnîgariya vê herêmê were bilêv kirin û teswîr kirin ne pênûs û ne jî hêza milan têrê dike.
Erê, em li vê herêma efsûnî roj bi roj hîn bi kûrtir diketin bin bindora hem xweşikayiya wê, hem jî zor û zehmetiya wê. Bi tecrûbeyan re me herêm nas dikir. Her diçû xebatê me pêşdiket. Dijmin bi agahiyên ku li ser xebatên me digirt zêdetir tirs û xof jiyan dikir û ew jî li herêmê xebatê xwe bi kûrtir dikir. Tirsa wî yê li hember gerîla dihişt ku bi lez û bez xebatên dijber bidomîne. Armanca me jî ew bû ku li hember hemû tiştên neyînî û dijber, bi îradeyekî bêhempa re hedefên xwe pêkanîn û rastiya Apocitî dayîna naskirinê bû. Hêviyekî bêsînor di nav me de hebû. Parvekirina me ji hev re, rêz û hiskirina di navbera hemû hevalan de nîşaneya ew biryarên dîrokî û rihê Apocitîyê bû.
Heval Mervan bi berpirsiyartiya ew biryarên girîng tevger dikir û yek bi yek bi hevalan re nîqaş dikir, fikr û nirxandina me yê li ser bûyeran digirt û bi vî rengî dixwest bigihije biryara herî baş. Yekîne ya me demêk bû ku li herêma Şîrwanê bû. Heval Mizgîn û heval Xeyrî hatin gel me. Ew wê biçûyana herêma Tatwanê. Lê heval Mizgîn, demêke li gel me ma. Di wê demê de bi pêşengtiya heval Mizgîn, moralekî hat çêkirin. Moral pir bi coş û şabûnê re derbas bû. Heval Mizgîn bi ew dengê xwe yê ku gûl û kulîlk, çiya û ber, av û lîlav, çûk û bilbilên xwezayê re dibû çavkaniya senfoniya giyanê û rengekî cûda da moralê. Careke din bi dengê heval Mizgîn re, di rih û ramana me de şewqa serkeftinê bi awayekî bêemsal beriqî. Ew deng dengê

hemû xwezayê di nav xwe de kom kiribû. Ew deng dengê serkeftinê û azadiyê bû. Xwîna ku di damarên me de derbas dibûn, bi dengê heval Mizgîn re gûr bibû, kelagerma dilê me, pola û hesinan diheland. Ev germahî û hêza me yê bêpênase tu asteng û keleman nas nedikir. Ev herêma ku ji aliyê me ve hîn jî temamî nehatibû nasîn de çavên me yê bêtirs, dilê me yê wekî agir ji me re dibû rêber. Roj û dem derbas dibûn, pêwîst bû ku êdî em bikevin nav amadekariya çalakiyekî xurt. Lewra jî di vê herêma ku pevçûn û nakokiya di navbera me û dijmin re dibû şahîd, pêwîstiya vê pevçûn û nakokiya bêdeng, bideng xistin xwe bi girîngî diyar dikir.
Hevalên rêvebir demekî bû ku ketibûn nav nîqaşa çalakî wê çawa, li kû derê û bi çi rengî pêkwere?.. Di encam de grubekî ji bo çalakiyê hate amade kirin. Ev çalakî ji ber ku li herêmê wê bibûya çalakiya me yê yekem, gelek girîng bû. Hemû heval bi baldarî û heyecanekî mezin re kêlî bi kêlî amadekariyên çalakiyê takîp dikirin. Ji bo me ev çalakî di bey qey wê bibûya nîşaneya me yê hebûn û nebûnê!.... Wateya vê çalakiyê hem di warê siyasî û hem jî di warê leşkerî de gelek girîng bû. Ger ev çalakî di aliyê me de serbiketa wê înîsiyatîf herêmê biketa destê me, lê ger ev çalakî vala derbiketa û binbiketa ji bo dijmin wê biba avantaj. Ji ber van hesasiyetan hemû heval ketibûn nav lekolîn û amadekariyê. Gruba çalakiyê bi fermandahiya heval Seîd hatibû amadekirin. Heval Seîd, hevalekî şerker, wêrek û di şerê xwe de bi mantik û xwînsar bû. Cihê çalakiyê jî piştî gelek nîqaş û nirxandinan “Şîrvan” hat pejirandin. Her

biryarek ji bo çalakiyê girîng bû. Lê belê her çendî di aliyê fedekarî, coşî û tevlêbûn û şerkeriya hevalan de tu pirsgirekên me tûnebûn jî, di aliyê hakîmbûna erdnîgariya herêmê de, dîsa naskirina gelê herêmê û sazkirina binesaziyan de gelek kêm û lewaziyên me hebûn.
Wê çalakî çawa bihata çêkirin, kijan noktê sexlemtir bû ku bihata şixulandin, dijmin kîjan aliyan de cih girtiye û kî an jî kê alîgirên dijmin bûn?.. Ji aliyên me ve baş nedihat
28

nasîn. Lê, li hember van dezavantajan me dîsa bi hêviya serkeftinê re dest bi amadekariyên çalakiyê kiribû. Belam, ji aliyê cehş û dijmin ve hesandina cihê çalakiya me re ev çalakî guncaw nehat dîtin û em vegeriyan cihê xwe. Em hemû hîn behtir hêrs bibûn û serkeftin hîn behtir ji bo me bibû wekî azweriyekî.
Heval Mervan civînekî çêkir û pêwîstiya pêkanîna çalakiyê nirxand û careke din ji bo çalakiya Şîrwanê grubek nû hat li dar xistin. Ji ber ku çalakî û hevalên ku vê çalakiyê pêk bînin ji aliyê dijmin ve hatibû nasîn, diviya ku guhertin bihata çêkirin. Cihê çalakiyê dîsa Şîrwan bû….
Belam dijmin koricitî destpêkî li Şîrwanê pêşxistibû.
Eşirtî û jiyana eşirtî li vir gelek bi cih bû. Dijmin ji bo ku ev jiyana eşirtiyê ku bi gewşînê xwe dijî cewherê Apocitî ye biparêze, destpekî serokê eşîran parast û eşîr tev de bi xwe ve girê da bû. Her wiha ji aliyê me jî ji ber ku ev çalakî bibûya çalakiya me yê yekem, divê ku cihê çalakiyê hem ji aliyê bîrdoziyê ve, hem jî ji aliyê stratejiya erdnîgariyê jî

Şîrwan cihê herî baş û watedar bû. Bi lexistina Şîrwanê bersiva jiyana paşverû, hevkariyê û her wiha di herêmê de bi awayekî balkêş, me hebûn û hêza xwe nîşanê dijmin û hêzên hevkar re bidan. Ji ber van sedeman, Şîrwan careke din bû cihê me yê çalakiyê. Gruba çalakiyê bi hesastir hat amade kirin. Fermandahiya grubê, heval Zeydîn û heval Mustafa bûn. Her du heval jî ji aliyên hevalan ve gelek dihatin heskirin û bi giranbûna xwe, zanebûn û gihiştandina xwe mînak bûn. Heval dîsa ketibûn nav tevgerekî bêaman. Coş û atîkbûna wan re tu gotin tunebû. Lê belê, di kûrahiya dilê me de şayîşekî hebû ku nedihat pênase kirin. Lewra jî bersiva vê hebû, nenaskirina erdnîgariya herêmê û nenaskirina koricî û sîxuran!…
Erê, plana çalakiyê amade bû… Li hember hemû metirsiyan û astengan, me dîsa jî vê çalakiya bixeternak dixwestin bixin nav pratîgê. Ewr û asîman, dar û berê ku şahîdên gelek gavên dîrokî û metirsiyanê careke din dil
29

bicoş, çav bihêvîdar li vê amadekarî û nîqaşan temaşe dikir. Di her lebitandinê me de çavê me li ew asoya bêsînor ve dieliqî. Bihar tenê ne a xwezaya bêhempa bû, bihar, bihara dilê me û armanca me bû jî. Dilê me bi vê pratîgbûyîna çalakiyê, wê bihara xwe hîn bi giyanber bijiya. Em, êdî bi vê dilbiharî ve ketibûn rê. Di rê de di bey qey em nedimeşiyan, piyê me ne li ser erdê bû, ewqas coşî û peroşmendî me jiyan dikir ku tu westandin an jî zorayî em nedihesiyan. Tu metirsî, me nedida seknandin. Metirsiya nenaskirina

erdnîgarî û gelê derdorê ne xem bû…Careke me biryar girtibû û ev ji bo me biryarekî dîrokî bû…Di xeyal û ramana me teva de serkeftina vê çalakiyê hebû. Bi van xeyal û ramanan em sê roj bûn dimeşiyan. Her gavekî me bi gelek hesab û hesasiyetan dihat avêtin. Bi hişyarî û baldarî li derdorê xwe dinêriyan û her tiştê vê xwezayê me dixwest ku di ramana xwe de xêz bikin. Em, hem ber bi cihê çalakiyê ve dimeşiyan, hem jî derdorê xwe bi vî awayî dinasiyan. Her du bi hev re pêk dihat. Lê em baş dizanibûn ku ev rewş ji bo me çiqas metirsiyekî û dezavantajekî girîng e. Dîsa jî me her tişt girtibû ber çavê xwe, sê roj bi vî awayî em meşiyan û gihiştin nêzê cihê çalakiyê. Ji bo çalakiyê her tişt hem di aliyê zindîbûna rih, hem jî di aliyê plan û amadekariyên çalakiyê de hazir bûn.

Heval hemû ji bilî nobedaran piştî ewqas meş û westandinê dema nîvro ketin xeweke şîrîn. Xewna biharê û germahiya nîvro, xewneke di bey qey li ser purtên kevoka xew dikî, ewqas mirov dikşîne nav xwe… Heval hemû bi xeyalên çalakiyê xew kiribûn. Piştî demekî kurt, ez jî bi xeyal û heyecanê çalakiyê ketibûm bin bandora xewna şêrîn. Bi bangkirina hevalên me yê nobedaran ji nişka ve em ji xew hilpekiyan. Dijmin me xistibû çemberê, derdora me hatibû girtin. Paşverûtiya hevkaran û îxanetê careke din bi hemû talbûna xwe ve derketibû pêşiya me. Meşa me ji destpêkê ve heta vê dema me yê îstirehetê ji aliyê qelhên koricî û hevkaran ve hatibû dîtin. Şayîşa me yê di vê warî de

bi awayekî berbiçav li ber me disekiniya. Koricî rêya me şopandibûn û agahî dabûn dijmin. Dijmin bi vê agahiyê dikeve nav tevgerê û bi hêzeke xurt re kêlî bi kêlî firseta “me bixin dest” sekiniye. Ew di vê xalê de ji me bêhtir bi avantaj bûn. Lewra pêşengên wan, qelhên ku erdnîgariya Şîrwanê û çiyayên vê herêmê baş dinasîn bûn.
Em hemû di kêliyekî de gelek tişt fikirîn û hema ketin nav tevgerê ku dest bi şer bikin. Hêrs û kîna me bibû wek volqanekî teqiyayî, diviya ku em bi vê lawên xwe dijmin û îxanetê bihelînin û bişewitînin. Armanca me qelişandina çemberê bû. Bersiva me ji dijmin re teqandina guleyan û heta dawî berxwedan bû. Di her helî de çavên hemû hevalan de werektî û fedakariyekî bêdawî dixuya. Di her aliyan de avantaj ya dijmin bû. Lê tenê tiştekî wan tunebû ku ew ji bo wan darbeyê mirinê bû, ew jî fedekarî û netirsiya mirinê bû. Lewra Apocitî mirinê kiribû jiyan…Her xwînekî şehîdan bi vê rihê bibû giyana hezar û mîlyonan. Bi vê rihê mirovên nemir hatibûn afirandin. Em 16 heval ji ber vê yekê bi bêtirs û werekiyekî bêemsal ve hêviya xwe neşikênand û me biryar da ku girê li ber me -ku cihekî stratejîk bû- destbixin û çemberê bi vî awayî biqelişînin. Bi fermana heval Zeydîn ku ew dengê wî yê ji xwe bawer tu car ji bîra min naçe, em bi pevçûn û bin barana guleyan de ber bi girê ve şerê xwe didomand û diçûn. Leşker, koricî û sîxuran li ser rêya me wekî xweliyê bûn. Di bin her latekî û tehtekî de tije bibûn. Her yekî me li ber hevalên xwe, xwe dikir sîper. Nedîtina şehadeta hev û ji bo hev xwe fedakirin di her tevgerekî hevalan de diyar dibû.

Şer ewqas xurt bibû ku her hevalekî ketibûn bin bandora hêrs û tolhildanê. Gelek heval ji hev qut bibûn. Bang li hev kirina me gelek caran bêbersiv dima. Dengê heval Mustafa jî nema dihat…Ew dengê wî yê ku berpirsiyartiya şoreşgerî û germahiya hevaltî ve hatibû pijandin nema digihişt guhên min. Heval Mustafa ku di dema seha Serokatî de ji aliyên Serok ve bi werektî û dirûstbûna xwe, mînak dihat nîşan dan, 31

niha bi ew werektiya xwe re di kîjan stêrkên asîmanan de nî-şanê bû û dirijiya, tenê ew dilên ku pêre diavêtin dizanibû. Di wê heyecan, toz û duman dîsa di bin baranê fişekan de ez û heval Zekî nêzê hev bûn. Hebûna heval Zekî ji bo min dibû hêzekî bêpênase û di hebûna wî de hevalan hevalên ku niha ji wan bêagahî bibûm didîtim. Lewra jî ez û heval Zekî bi hev re bêhn û hewaya Botanê girtibûn. Li Botanê jî em bi hev re mabûn. Şerkeriya wî kena wî ya ji dil di wê pevçûna ku asîman jî ji me nedihat xuya li ber çavên min bû. Lê ew guleyên îxanet û paşverûtiyê heval Zekî jî ket. Di wê kêliyê de hemû jiyana min û hestên minê ku di nav şoreşê de di dil û rihê min de cih girtibûn, carekî de gûr bûn, di aliyekî de li ser dijmin guleyên xwe yê tolhildanê dirijandim, di aliyekî de jî min hewil dida xwe ku bigihijim heval Zekî. Bi gelek metirsiyan re xwe gihandim cem heval Zekî. Lê belê heval Zekî bi giranî birîndar bibû û tenê dixwest ku ez xwe xilas bikim. Lê kîjan dil di wê kêliyê de dixwest dest ji hevalê xwe berde. Kîjan dilê şoreşger wê vê xwestekê pêkbiniya. Tu hêz û kuweta heval Zekî nemabû û nikaribû

xwe bilebitîne. Cara dawî bi awayekî hişk li min nihêrî û got; “Daxwaziya min ewe ku biçî û bigihijî hevalên din. Ez êdî nema dikarim” Fermanekî hişk û pêwîstekekî şoreşgerî da pêşiya min. Bi dil şikestî û bi êşên bêpênase, çanta û çeka heval Zekî girt û beziyam cem hevalên din. Em heft heval mabûn. Derbaskirina çemberê gelek kêm mabû. Lê belê em, li ku derê ne, erdnîgariya vir bi çi rengiye nizanibûn. Lê hîn jî em di nav şer de bûn. Carna ji hev vediqetiyan û careke din dihatin cem hev. Ez û hîn hevalên din derketibûn devreyê çemberê.

Dawiya pevçûnê 11 hevalên me bi qehremanî şehîd ketin. Ew roj di asîmana bêdawî de 11 stêrk rijiyan. 11 stêrk êdî bibûn tîrêjê rojê û şewqa xwe di germahiya roja bêhempa de digihijandin me. Heval Mustafa Gulo, Salîh Keçî, Resûl Şirnax, Rêzan (ji başûrê biçûk bû), Bişar Didêrê, Ferhad Dîdêrê, heval Adîfe û Sîdar dîsa du hevalên ji ber ku em

zêde gel hevûdu nemabûn navê wan nizanim, di vê pevçûnê de tevî karwanê şehîdan bûn. Ew bibûn efsaneyê qehremanî û fedekariyê. Her ji van stêrkan yek efsaneyekî bi serê xwe ye. Ew ji bo min û hemû hevalên me, her tim dibin çavkaniya hêvî, bawerî, fedekarî û berxwedaniyê. Ew bi rihê Apocitî, di rih û ramanên xwe de bûne yek. Pîvanekî me yê xwe ji ber çavan derbas kirinê û xwe paqij kirinê jî ew in. 11 hevalên nemir ku di di ronahiyê rojê de giyanber bûn, di herêmê de ji bo me bûn bingehê serkeftin û herêm bixin bin bandora xwe. Çawa ku em bi qehremanî û şerkeriya hevalan

bandor bûn, ewqas gelê vê herêmê jî li hember vê berxwedanê bi zindî rihê Apocitî û rastiya gerîla naskir. Belkî di kêliyê pevçûnê de avantaj ê dijmin bû, lê belê di aliyê serkeftin û qehremantî avantaj ya me bû. Piştî van qehremantiyan gelê herêmê bi rêztir û germtir nêzê me bûn, koricî û hevkar jî êdî bitirs bibûn. Gelek pîvanên şoreşgertî bi berbiçavî di vê herêmê de xwe dide xuya kirin. Ewê ji me re her tim bibin pîvana jiyan û mirinê.
Vegotin: Osman Ala
33

WÎ JİYANA XWE KİR
QELENA JİYANEKÎ!
“Wê çaxê gotinan xwe j imin dûr dikirin. wê çaxê tevahî peyv nîvço ji zimanê min derdiketin.”
Cara yekem min hevalê Salim di sala 1993 an de li Zelê di perwerdê de nasî. Di serî de me baş hev nas nedikir. Jixwe di wê çaxê de tişta herî girîng ew bû ku, em bi perwerdê re jiyan bikin. Ji ber vê yekê em zêdetir bi kar û perwerdê re mijûl dibûn. Tevî vê yekê me hevalên li kêleka xwe jî, hêdî hêdî dinasîn. Yek ji wan hevalên ku min naskir, hevalê Salimê Bazîtê bû. Heval Salim di dawiya sala 1991 ê de tevlî partiyê bibû û yek ji gerîlayên ku di şerê başûrê 92 yê de cî girtibû bû.
Dema ku min heval Salim nasî, ez pir pê bandor bûm. Wî di wê demê de bi hevaltiya xwe gelekî alîkarî bi min re kir. Dikarim bêjim ku “ew sembola rêhevaltiya rasteqîn bû.” Wî bi şêweyê axaftine, dan û sitandine, meşandina jiyanê û bi

hevalê kêleka xwe re mijûl bûnê re ev rastî nîşan dida. Bi kûrtasî di her warên jiyanê de, wî ev rastî bi me dida jiyankirin.
Ev naskirina min ji heval Salim re, bi qasî salekî di wê perwerde de domand. Piştî salekî tijî dersên ku min ji wî hevalî wergirtî, perwerde bi dawî bû û em belav bûn. Tevî wê yekê jî tişta di dilê min de bi cî hat! Min qet rojekî nedixwest ku ji wî cuda bibim. Ev yek jî bi çûna me ya qampa Bedewan, nêzî Hewlêrê, bi cî hat. Li wir jî bi qasî mehekî, em dîsa li gel hev man. Heyanî wê çaxê heval Salim
34

serleşkerê manga me bû. Wî di dirêjahiya salekî de, bi kesayeta xwe gihiştî, ez ferî gelek tiştên nû ên jiyanê kirim. Dema ku belavbûna me hat çêkirin, em ji bo xebatê derbasî Heftanîn bûn. Devera ku em çûnê de jê re digotin "Geliyê Pisava, Dola Zawitê" wê çaxê ew bibû sê sal ez tevlî partiyê bibûm. Lê heya hingî ez derbasî nava şer nebibûm. Çûna me a Heftanînê jî di vê hêlê de ji bo min xwedî wateyeke mezin bû. Piştî demek dirêj di nava gerîla de û derfetên ku me ji perwerdan wergirtibûn, derbasbûna nava şer mîna xewnekî bû ji bo min. Di hêla din de ew nêrîna ku li ser Zelê û hevalên di Zelê de hatî rûniştandin, encax bi piratîkeke serkeftî bihata rakirin. Wê çaxê hevalên di Zelê de diman mîna kesên li rehetî û xweşiyê digerin dihatin nirxandin. Bi kinasî peyva "oportînîst" bibû behra me. Ji ber wan nêrînên wê demê, me dixwest rojek berî rojekî em derbasî nava şer bibin û xwe nîşan bidin. Wate weke

misilmanê ku zû diçe mizgeftê, berî dema limêjê derbas dibe, li me hatibû. Çûna me a Heftanînê jî despêkek nû bû ji bo me. Me êdî serkeftin di karê xwe de kiribû qelenê derbaskirina wan nêrîna.
Gava em gihiştin Heftanînê, ji bo me komcivînek hat lidarxistin. Di civînê de biryara belavkirina hevalan li ser heremên cuda hat girtin. Ji ber zêdebûna hijmarê, yekîneyekî nû çêbû û me di nav de çi girt. Ji bo bi cîbûna me, Deriyê Dawetiya ku devereke stratejîk e di Heftanînê de, hatibû diyarkirin. Ew dever dikeve nêzî sînorê bakurê Kurdistan. Wate em di nava heval û dijmin de bi cî bûn. Deriyê Dawetiya xwediyê deşt û zozanekî gelek xweş û bedew bû. Ew der ji bo xwe parastin û şerkirinê pir guncaw bû. Gellek deverên xwe yên asê û saxlem hebûn. Jixwe darên wir mîna xemlekî bû û ew zozan dixemilandin. Bi kuratasî xwezaya Deriyê Dawetiya hêja bû ku mirov pişta xwe bidiyê de.
Di meha Tebaxê de me dest bi amadekariyê cîbûyînê kir. Me jî ji bo pîrozbahiya 15 Tebaxê amadekarî dikirin. Şensê min ê herî mezin jî ew bû ku çalakiya xwe a yekem, min ê di
35

rojek wisa pîroz de bikira bû. Ji bo ew roja watedar, hevalan çend rojan keşifa xwe kirin. Bi qasî heftekî amadekarî domandin. Armanca me, çalakiyek bêzerar bû. Bi sedema ku devera em lê diman di sînorê başûrê welat de bû û şûna ku me yê çalakî lê bikira di bakûr de bû, em neçar bûn ku hîn hefteyek ji roja çalakiyê re mayî, amadekariyên xwe bikin. Ji her hêlî ve heval pêdiviyên şer amade dikirin.

Êdî piştî wan rojên xwe hazirkirinê, hevalên yekîneyê ku hijmara wan digihişt deh kesî ketin rê. Bi coşiya çalakiya yekem, bi êvarî re em ketin rêya Gundê Alûç. Gundê Alûç ku girêdayî herema gûyîyan (Uludere) ye, şûna ku em ê lê bisekiniyan bû. Piştî şevekî ji meşê em gihiştin Gundê Alûç. Ji bo çalakî li gorî daxwaziyên me pêk were em di hêla parastinê de, gelek girên bilind ên li dora xwe girtin. Devera ku çalakî wê lê bihata kirin, Gundê Roboskî ê girêdayî Uludere bû. Çalakî pêşî girtina panzêrên ku ji Uludere dihatin Roboskî û êrîşkirina li ser wan bû. Ew gund bi merkeza çetên Mala Peyrê tê nasîn. Devera ku hevalan ji bo êrîşkirina li ser dijmin diyar kiribûn, pênc deqan dûrî Gundê Roboskî bû. Ew der xwedî daristaneke fireh û mezin bû, ji her hêlî ve ew der guncaw bû.

Beriya destpêkirina çalakiyê, nav hatin xwendin.

Hevalên êrîşê çar û ên ew diparastin jî çar bûn. Hevalê Salim jî di nava her çar hevalên parastina êrîşê dikirin de bû. Bi giştî yekîne bibû pênc gurup. A yekem ji bo êrîşê li ser panzêrê, li ser rê bi xwe. A didoyan nêzî wan li jor disekînin. A sisêyan a ku min di nav de cî digirt bû. Ew jî ji bo parastinê bû. A çaran jî ji bo destekdayînê û parastinê bû. Jixwe a dawî jî di hêlekî de revebiriya çalakiyê dikir, di hêla din de tim ji bo parastinê amade bûn. Wate bi giştî, ew girê nêzî rê, mîna bûkekî bi xelekên gerîla hatibû xemilandin. Tenê kêliyên kurt ji bo despêkirina awazên pîrozbahiya 15 tebaxê mabûn. Hîn êvara 13 yê tebax bû, her yekî enîstiromantala xwe hilgirtibû û di sengerê nêzî rê de bi cî bibûn. Her heval bi bêsebrî li benda katjimêra çalakiyê bûn.

Lê dema panzêr ji dûr xuya kirin, hevalan fermana ne êrîşkirinê dan! Wê kêliyê zanyarî gihiştin ku, erebekî çetan tê li şûna êrîşkirina li ser panzêrê û êsîrgirtina wan çetan bû armanc. Ji ber vê yekê panzêr di ber me re derbas bû bê ku em êrîş bikin. Paş demekî di heman rê re, ereba çetan diyar bû. Hevalên di êrîşê de cî digirtin, bi dîtina erebê, derketin ser rê, erebe sekînandin û dema ku yên di erebê dene peya kirin, me dît ku du jin, du zilam û zarokek 5-6 mehî di destê jinêkî de jî hebûn. Silahên sivik ên bi çetan re jî tev dest li ser hat dayîn. Armanc êdî bibû birina wan çetan ji bo şûna em lê diman. Pişt re jî bi şertê ku çetên wan gundan bi ser me de newin û sîlahên xwe deynin; me yê ew serbest berdabana. Tevî ku çetan dixwestin hevalan li ser rê dereng bihêlin û mijûl bikin jî, kes ji hevalan, bi tehdît û gotinên nexweş, nêzê wan nedibûn. Wê çaxê em pir keyfxweş bûn ku çalakî bêdeng ber bi serkeftinê ve diçe. Mixabin sengerekê çetan ku li milê din ê rê bû -ji ber ku pir veşartî bû, me nedîtibû- dema heval erebê disekinînin û çetan êsîr digrin, ew dibînin û di cî de xeberê didin dijmin. Ji ber ku şûna çalakiyê di nava çar gundan de bû û her yekî deh deqan ji me dûr bûn, hin heval li ser rê, em bi dengê kawenan veciniqîn. Tişta herî ji bo min seyr, tevî ku çetên dijmin jî bi hevalan re bûn, dîsa jî bi hawanan êrîş dikirin. Jixwe di demek kin de, ew der tijî leşkerên dijmin bû. Wê çaxê xeber gihişte me ku hevalê Seyat û Salim êsîran tînin û tên. Ji ber vê yekê fermana paşvekişê hat dayîn. Me jî bê avêtina guleyekî, hêdî hêdî ji

nava guleyên dijmin xwe da paş. Dikarim bêjim ku me tevan bi zorê xwe ji cihê xwe gihande dola pişt me. Di hêla din de roleke mezin a daristanê hebû ji bo parastina me. Wê kêliye em ji hatina hevalan piştrast bûn. Ger me bizaniya heval li wir cîyê mane, me tu carî cihên xwe bernedida. Lê ji ber xeberdana rêvebiriyê ku heval bi êsîran re tên me paşvekiş kir. Piştî meşa du saetan em gihiştin Dola Roboskî. Keyfa her hevalekî ji ber nedayîna ziyan û şehîdan li cî bû. Bi gihiştina me ya dolê, hevalên din jî li paş me gihiştin. Êdî
37

metirsî derbas bibû û em dûrî dijmin mabûn. Lê hîna hevalê Salim û Seyat nehatibûn. Me wisa fam kir ku ew li pêş me çûne şûna ku em ê lê bighên hev. Ji ber vê yekê me rêya xwe domand heya em gihiştin cihê xwe.
Lê herdu heval nehatibûn wir û ji ber ku cihaz bi wan re tunebû, me nikaribû şûna ku lê dimînin jî fêr bibin. Wê çaxê sawek kete dilê min. Hevalê Salimê ku ew ji salekî zêdetir bû me hev dinasî û cihekê taybet di dilê min de digirt, bi nehatina wî re dilê min dikiziriya û ez ketim nava gumanan. Heya wê çaxê neketibû bîra min ku em ê ji hev qut bibin. Jixwe şehîtbûn tu carî neketibû xeyalê min, ya rast min nedixwest têximê de jî. Ew roj tev bi hizrandina li ser heval Salim derbas bû. Xew bi çavê min neket wê rojê. Bi derbasbûna wê rojê re û hatina rojek nû, min ji rêvebirên ye-kînê pirsî:
-Ka heval Salim nehat?
-Na heval Cihan, ew hîn nehatine. Xeman nexwe.

A rast wan nedixwest rastiyê ji min re bêjin! Lê dîsa jî ez neçarbûm ku xwe bi wan gotina qayîl û bawer bikim. Wan dizanî bê pêwendiyên min û heval Salim çiqas bi hev re xurt û rasteqîne ye. Wê rojê jî mîna mirovekî pir birçî, min xwe bi gotinên hevala gihand êvarê. Di van herdu rojên bêheval Salim derbasbûyî de, weke mirovekê bi tenê û bêxwedî min xwe hîs dikir. Kêlî li ber min dibûne sal hingî ez çav li rê bûm. Lê bi hatina wê evara dûyem re, û nehatina heval Salim û Seyat, mîna ku stêrkên ezman ji dilê min birijîn, min hîs bi şehîdbûna wan dikir. Lê tevî wê jî ez bêhevî nedimam.
Piştî du rojan ji vedana konê xemginiyê, hevalan da diyar kirin ku, herdu heval şehîd ketine. Wê çaxê gotinan xwe ji min dûr dikirin. Wê çaxê tevahî peyv nîvço ji zimanê min derdiketin. Jixwe giraniya vê nûçeyê li hêlekî bû û şêweyê şehîtketina herdu hevalan li hêlek din bû. Piştî çend rojan ew çetên êsîr gihiştin me û gotin:
-Hevalê Salim ji destpêkê û heya destpêkirina şer jî zaroka ku bi me re bû li ber singa xwe hildigirt. Wî mîna
38

parçeyek ji canê xwe nêzî zarokê dibû. Dema ku şer jî dest pê kir, heval Salim zarok di hembeza xwe de vedişart ku tu tişt ji zarok newe. Wî tim pişta xwe dida hêla ku gulê jê dihatin ji bo gûlê li zarokê nekevin. Lê mixabin ji ber ku dijmin pir nêzî me bû, heval Salim ji pişta xwe gule xwar û heya ket jî nehişt zarok ji hembêza wî bikeve.
Erê! Heya wan gundiyan jî bi keser çîroka şehîdbûna herdu hevalan vedigotin. Ew jî ji ber wê şehîdbûnê bibûn

mirovên din. Ê yê me û bi taybet ê min ku ewqas demê ez bi wî hevalî re mabûm wê çawa be?.. Wî hevalî bi salan ji bo ku ken were li ser rûyê zarokên Kurd têkoşîn kir. Tevahî jiyana xwe fedayî wan armancên pîroz û binirx kir û di dawî de jî, ji bo jiyana zarokekî xwîna xwe feda kir û ew zarok xelas kir. Wî hembêza xwe ji a dayîka wî zarokî saxlemtir didî û wisa jî bû!

Heval Salim ne tenê di dilê me de, di dilê her kes ên welatperwer de bi cî bû. Ew ê bibe helbest, çîrok, destan û zarokên mîna ê li ber hembêza wî, we li ser mêrxasiya wî û yên wek wî fêr û hîn bibin. Ew ê tim di rûpelên herî paqij ên vî welatî de cî digire.

Vegotin:Cîhan Qûrtelan

39

ÇİYAYÊ REŞKÊ

“Êdî dema tevgerê hatibû. Heval hemû bi bîr û baweriya serkeftinê ve ketibûn nava tevgerê. Me xwe bi coş û peroşmendiyeke mezin ve ji bo vê peywira nû amade dikirin. Ew peywir ji bo me pîroz bû.”

Sala 1994an, di meha Adarê de sererastkirina yekîneya me çêbû. Me, gelek hevalên vê yekîneyê, nedixwest ji herêma Uludere derbikevin û biçin herêma Metîna. Ji ber ku sala 1993an de gelek hevalên ku me nasdikir, li vê herêmê şehîd bibûn, lewma jî di hêla manewiyatê de ji bo me ev der gelek watedar bû. Me, li vê derê, gelek zor û zehmetî bi hevdu re parve kiribûn. Heskirin, bi ked û di rewşên zor û zehmet de tête afirandin. Heskirina me ya ji hev re û ji

herêmê re jî, bi van merc û zirufên zehmet de vejiya bû. Ji hev û ji herêmê veqetandina me, weke neynokekî ku ji goşt bête veqetandin, bi êş û jan bû.
Lê, ev fermana partiyê bû. Her çiqas çavkaniya hestên me, li vê herêmê û hevalên ku me gelek caran bi hev re pira mirênê derbas kiribû de diherikî. Lê belê ji bo me, berjewendî û fermanên partiya me ji hemû tiştan zêdetir giring bû. Lewra em him bi moralekî geş û him jî bi moralekî nîvsar, hatin yekîneya herêma Metîna. Gelek hevalên ku bi me re hatibûn, tevlî konferansê bûn. Tevlîbûna konferansê ji bo me hêzekî mezin bû. Di rih û ramana me de moralekî bilind û hêzekî ku ji çavkaniyekî bêdawî bête xwedîkirin, diafirî. Dîsa berhema moralê me yek jê, ji bo derbasbûna herêmên hundir hêz wê ji vê herêma Metîna yê bihata
40

amadekirin. Ji vê yekê, li Metîna şahî û coşiyekî bêhempa dihat jiyandin. Her çiqas rewşa herêmên hundir zor û zehmet be jî, ewqas rihê hevaltî, îradeya şoreşgerî, heskirin û fedakariyên gelek mezin, di rewşên bi vî awayî de derdiket holê.
Di sererastkirina yekîne yê de, em tevî yekîne ya, heval Êrîş bûn. Heval Êrîş bii nêzikatî û helwestên xwe yê li gorî pîvanên bîrdoziyê ve, xwe dabû heskirin. Yekîneya ku heval Êrîş fermandar bû, hem di aliyê jiyanê de hem jî di aliyê şer de mînak bû. Yekîne ji heval Êrîş moralekî mezin digirt. Pêşengtiya wî yê jiyanê de baweriyekî giring dabû heval û hogirên wî. Cî girtina me yê di vê yekîneyê de, ji bo me

şansekî baş bû û di demekî kurt de em hînê wê herêmê û hevalan bûn. Di nav vê yekîneyê de fedakarî û hevaltiyekî ku tu gotin nikare wê bide diyarkirin û taswîrkirin hatibû afirandin. Hemû heval, di rih û raman de yek bûn. Wêneyê hevalekî, wêneyê hemû hevalan bû! Ev rastî, baweriyekî gelek mezin di navbera hemû hevalan de çêkiribû.
Êdî dema tevgerê hatibû. Heval hemû bi bîr û baweriya serkeftinê ve ketin nav tevgerê. Me xwe bi coş û peroşmendiyekî mezin ve, ji bo vê peywira nû, amade dikirin. ew peywir ji bo me pîroz bû. Herêma ku em ê biçûyanê, hîn di nav berf û sarma yê de bû. Gelek gir û dol hîn bi berf bûn. Ev, nîşana pratîkekî zor û zehmet bû. Lê belê, moral û viyana hevalan li hember vê rewşê hîn xurttir û bilindtir dibû. Me bi zanebûna berxwedanekî mezin ve, herêm kişf dikirin. Moralê me qet kêm nedibû. Neh-deh rojan em meşiyan. Meşekî gelek zor bû. Li hember bêpêdiviyan, serma û seqema hewayê şerekî dijwar dest pê kiribû. Lewra têkoşîna gerîla tenê bi dijmin re nîn e. Têkoşîna wan a herî mezin yek jî, têkoşîna bi xwezayê re ye. Ew jî, gelek caran di nav me de hin hevalên me yê ku ji parçekî rih û canê me bûn, girt! Di dilê me de şopên gelek bi êş û jan hişt. Lê belê, em li hember wê, ne bi kîn û rik in!. Ew bê me, em jî bêyî wê nabin. Di bêjin ku “heskirin, bê neheskirinê nabe!" Gerîla jî,
41

xweza yê him gelek jê hesdike û yên ku herî zêde bi xwezayê re yekdibin dîsa gerîla ye, him jî yên ku li hember xwezayê şerê mezin didin jî gerîla ye. Em bi şerekî bi vî

awayî ve ku di her gavekî de li ser rûpelên dîrokê şopên xwe dida diyarkirin, meşiyan. Di bin hewayekî sar û seqem de bi zeraqeyên sibehê re gihiştin gundekî. Hatina me ya gund ji bo me gelek girîng bû, ji ber ku, em nêzî gel bibûn. Belkî ev ji bo mirovekî normal ne tiştekî wisa cuda be. Lê belê ji bo gerîla, ev tişt gelek girîng e. Gerîla, berî her tiştî parçekî ji dilê gel e. Ew bi gelê xwe re, heye. Bingeha berxwedana şerên dijwar û rewşên gelek zor û zehmet ji vir tê. Ew bi hêzên, zarokên ku di nav birçîbûn, tazîbûn û bêmafê jiyanê dijîn berxwedan dikin. Ew bi hêzên, ku dayîk bi şev û roj ji çavan rondikan kêm nakin, xwîna xwe dirjînin. Hatina me ya gund ji bo vê yekê girîng bû û di nav me de gelek hestên cuda-cuda diafirand.
Li daristina ku hinek li derveyî gund bû, em bi cih bûn.
Lê, li hember ewqas westandinê, vehesandin û xewkirin nedihat bîra kesekî. Zindîbûnekî bêhempa di nav me de aj dida. Heta sibehê em li wir man, piştî ku roj bişkivî me xwe berda gund. Bi moralekî gelek bilind û bi hestên wekî deryayê nêzîkê gel dibûn. Dilê me bibû weke deryayekî û gel hembêz dikir. Her yekî wan ji bo me ji hemû xezîneyê dinyayê bêhtir bi rûmet bûn. Bi coş û peroşmendiyên bi vî awayî belavî nava malan bûn. Destpêkê gel, bi şêweyekî eceb li me nihêrî. Bi şêweyekî ku bi çi awayî ev sarma û seqem hatibû qelişandin, li me dinêriyan. Piştî demekî behitîbûyîna wan hinek kêm bû, di her malî de giliyê gel, ku dijmin li ser wan zor û zordarî dida meşandin, dihat bihîstin. Ew di nav dîdariya ku hezar salane dereng mabû de bûn. Hêvî û daxwaziyên xwe yê hezar salan, di vê dîdariyê de

dianîn ziman. Her gotin û giliyê wan, ji bo gerîla wekî xençerekî jehrî, li ser dilan dihat çikandin. Gerîla êş û jana gelê xwe ji dil de hîs dikir. Gotinên gel, ku digotin; “hûn eskerê me ne. Serê me bi we bilind e. Neçin. Li vir cem me
42

bimînin. Em êdî ji leşkeran natirsin” li ser me bandorekî mezin dikir. Gund bi gund em di wê herêmê de digeriyan û di her gundekî de malbatên hevalên me hebûn. Dema ku me xwe dida naskirin, ew ewqas keyfxweş dibûn ku êdî nizanibûn me bi çi awayî hilgirin. Ew jî aboriya xwe, bi rojane pêkdianîn. Jixwe ji bo me pêwendiyên girîng, pêwistiyê me yê bi doxtor û dermanan pêkbihata bû. Çimkî em, gelek caran dibûn şahîdên, hevalên me yê ku birîndar ji ber bêdoxtor û dermantî bi çi awayî şehîd diketin. Ev rewş ji bo me, êş û elema herî zor bû. Lewra di wê dema zor de hevalekî me yê ku hîn nû tevlî refên gerîla bibû, li Katoyê Mînosê pêlî mayînekî kir û ji lingê xwe birîndar bû. Lê belê nepeydakirina me yê doxtor û derman, hişt ku ev hevalê me li ber çavên me şehîd bikeve. Dilê me, di bey qey li ser koza agirê bû, dikiziriya, dişewitiya. Lê belê, bêçaretî careke din derketibû pêşiya me. Ango em vê bêçaretiyê ji bo xwe nedikir asteng û kelem. Me ew ji bo xwe dikir sedema hêz û têkoşînekî hîn xurttir û bilindtir. Hevalekî me yê ku warê mî-ran û dîrokên veşartî li Botanê, Gabara bi nav û deng de mezin bibû, bi tevlîbûna xwe yê karwanê şehîdan ve êdî meşa xwe yê têkoşînê bi awayekî din didomand. Şehîd ji bo me, her tim pêngavên nû ne. Ew pêlên bilindbûna têkoşînê

ne.
Erê, di aliyekî de bi dilşewatî di aliyekî de jî bi peroşmendiyê tevgereke nû ve, me meşa xwe berdewam kir. Her hevalekî me, li derdorê xwe bi baldarî dinêriyan. Naskirina arazî ji bo gerîla girîng bû. Ji ber vê yekê bi xwezayê re yekbûn û wekî parçeyekî xwezayê tevgerkirin pîvanekî jiyana me bû. Bi baldariya pîvanên bi vî awayî re, em ber bi Sevdinê ve diçûn. Naskirina herêmê tenê bi naskirina xwezayê re nebes bû. Divê te ku jiyan, çand, dab û nêrîtên wê civakên herêmê jî bihata naskirin. Her çûna me, ku em nêzî herêma ku em ê biçuyana wir dibûn, ewqas jî pêwendiyên me yê amadekariyê zêde dibûn. Pilana çalakiya me, hîn bi awayekî zelaltir xwe diyar dikir. Di wê navberê
43

de, ku pilana çalakiyê xwe me dikir, dijmin li milê Lewînê operasyon dest pê kiribû û çemberê wî gelek mezin bû. Hevalên me yên wir, di nav vê çemberê de bûn. Mecalên wan ê xwe xilaskirinê, gelek zor bû. Bi girtina vê agahiyê re, em ketin nav tevgera ku bala dijmin bi awayekî bikşînin ser xwe, bi vî awayî barêhevalên xwe sivik bikin û hevalan ji nav çemberê xilas bikin. Me biryara “Êrîşê li ser qerekola dijmin bikin” girt. Her çiqas gelê herêmê em nasdikirin û ew ji me bawer bûn jî, me dîsa ewlekariya xwe baş digirt û gelek hişyar bûn. Bi berpirsiyartiya şoreşgerî û tiştên ku me ji felsefa serokatî girtî ve, ji hevalên xwe yê ku rewşa wan nebaş bûn, me, xwe berpirsiyar didît û ji ber vê yekê jî tû hedana me nedihat. Yekîneya me tev de bêhedan bûn. Di her

çavên hevalekî de, ew berpirsiyartî, ji hev heskirin, cesaret û bawerî dihat dîtin. Di nav bêdengiyê de, dengên ku guhên mirov diteqîne dihat jiyandin. Çavên me tim diçû ser heval Fîras. Bi nerînên xwe re, me ji heval Fîras re digot; “Me zû bighîjîne nêzî hevala û cihê ku em ê çalakî çêbikiran.” Heval Fîras pêşengê me yê rê bû. Bi zîrektî û çelengiya xwe ve bi nav û deng bû. Cihê ku ew keşif dikir, careke din ji keşifkirinê re pêwistî nedihat dîtin. Yekîneya me, ji heval Fîras gelek hesdikir. Di pêşengtiya heval Fîras de gelek çalakiyên bi serkeftî hatibû pêkînandin. Ev rastiyên heval Fîras, di nav hevalan de baweriyekî mezin afirandibû. Bi heval Fîras re rêwîtiya çalakiyê tiştekî cuda bû.
Em bi nêrînên xwe yê ku di nav bêdengiyê de dengên gelek bilind jiyan dikir dîsa ketin bin bandora hestên xwe yê bêhedaniyê. Wêneyê hevalên me yên ku di çemberê de şehîd diketin, gundên ku di nava dumana şewitandinê de winda dibûn, zarok, jin kal û pîrên ku pêxwas ketibûn riyan, li ber çavên me yek bi yek derbas dibûn. Ev wêne, di dilê me de cî digirt. Şopa wan, bi şopên wêneyên komkujî û tevkujiyên hezar salan ve yek dibûn û di rûpelên mejiyê me de xwe bi cih dikir. Dengê gelê me yê ku digotin; “tu car em ji welatê xwe venaqetin. Em dev ji axa bab û kalê xwe bernadin. Canê
44

me û rihê me di van agiran de bête şewitandin û xwîna me bête zûhakirin jî dîsa naçin tu der” ji bîr û ramana me dernediket. Kîn û hêrsa me her diçû zêde dibû. Sonda me ya “heke mirinekî me hebe, wê ji bo vê gelî be” her tim dubare

dibû. Hestên me dibûn lehî, tu asteng û kelem li hember xwe nedihişt. Di vê navberê de, amadekariya çalakiyê de agahiyekî gihişt destê me; yekîneya tevgerî, wê were cem me û bi hev re çalakî wê pek were. Vê agahî em gelek keyfxweş kirin. Ji bo hemû tiştan, di hêla aborî û pêwistiyên leşkerî de me amadekariyê xwe dikir. Bi hatina hevalên me yê tevgerî re çalakî wê bi awayekî hîn mezintir û xurttir bihata pêkanîn. Agirê dilê me hîn geştir bibû. Hemû heval ketibûn nav tevgerekî mezin. Moral, coş û peroşmendiya me, bi girtina tola gel û hevalên xwe re ku bi vê çalakiyê me yê pêkbianiyan, mezintir dibû. Amadekariya me temam bû û hevalên ku em benda wan bûn, hatin. Bi xêrhatina hevalan, me torenek çêkir. Piştî torenê, di aliyekî de ji bo hevala xwarin û cihê vehesandinê dihat amadekirin di aliyekî din de jî, bi moral û bîrkirinekî mezin me hev hembez dikir. Ev, dîmenekî bêhempa derdixist holê.

Nîqaşên wan ê li ser bîrdozî, rastiya serokatî û pîvanên diyalegtigê gelek biponijî û kûr bû. Em jî ji wan re li ser erdnîgariya herêmê, dîsa li herêmê cih girtina dijmin bi çi awayiye, hêzên wan çiqas e, hêlê wan ê qels çi ne, çekên ku bi kar dianîn çawa ne û hwd. agahî didan û li ser van guftugoh dikir. Her ku me hev nasdikir baweriya me ji hevdu re xurttir dibû. Jîrbûna wan hevalan li ser me gelek bandor kir. Tevlîbûna wan ê jiyanê, ciddiyeta wan ê jiyana eskerî û kûrbuna wan ê bîrdozî û siyasî li hember hev rûmet û qedrekî giring afirandibû.

Piştî şeş rojan, amadekariya çalakiyê temambûn. Êdî roja çalakiyê hatibû. Hemû hevalan bi rih û ramanekî bêhempa

amadeyê pêkanîna çalakiyê bûn. Li gorî pilana ku çêkirî; destpêkî êrîşê pênc girên ku dijmin li wir cih girtibû, wê bibûya. Gruba êrîşê yekemîn û bi çi awayî wê êrîş çêbûya
45

hate amadekirin û nirxandin. Dema êrîşê, di kêliyekî de çêbû. Heval kêliyê baş nirxandin û tu şehîd neda dayîn. Her pênc gir jî, bi serkeftî hat destxistin. Coş û şahî ya ku me dijiya bêtarîf bû. Di navbera bîst deqan de her pênc gir ê me bû û deng û hisa dijmin qut bibû. Niha dora pilanê duyemîn bû. Êrîş wê li ser qerekolê pêkbihata. Em bi vê serkeftinê re ji xwe gelek bi bawerbûn, tenê dengê serkeftina me, dihat me. Lê gotinek heye; “av xewdike lê dijmin xewnake.” Ev gotina kal û pîran careke din rastiya xwe dida xuyakirin. Dijmin dema vedigere û giran dihêle, fêmdike ku em ê niha êrîş bibin ser qerekolê û di cih de ew jî pilana xwe çêdikin. Li ser rê, hawan û sîlahên xwe yê giran bi cih dikin. Di kemînê de benda me disekinin. Me digot qey êdî dijmin nema dikare derbikeve pêşiya me. Ji ber vê yekê hêviyekî me ya ku kemîna dijmin heye qet tunebû. Dema ku em gihiştin ser vê riyê, nişkêve gulebaran û toz û dumana çekên giran ve em rû bi rû man. Di wê kêliyê de du hevalê me, ku yek ji wan heval Rifat bû, êrîş dibin ser dijmin û şehîd dikevin. Heval Rifat, hevalekî cansivik bû. Bi cansivikî û jîrbûna xwe yê di êrîşê de, dihat nasîn. Dîsa ew berî hemû hevalan hewil dabû xwe û ji êrîşa dijmin re bibû bersiv. Werekiya wî ya mezin, nehişt ku serkeftina me di bin siyê de bimîne. Erê, du şehîdê me çêbûn, du canê me dîsa şopê xwe di dilê me de hiştin û

ber bi rojê ve meşiyan. Ji vê êrîşa dijmin em xilas bûn û serkeftina me bi şewqa rojê ve tarîtî qelişand. Lê, hedana me tê!? Lehîya dilê me disekine!? Na! Hîn bi xurttir lehiya dilê me pêl bi pêl diherikî û em ketin amadekariya çalakiyekî din. Hedefa me ya vê carê milê Başkale bû. Hêzên dijmin li wî herêmê çiqas e, li ku derê û bi çi awayî bi cih bûne, hejmara mevzî û eskerên wan çendin, çekên bi çi awayî didin bikaranîn? Hemû hat nasîn û amadekariya çalakiyê hat pêkanîn. Ji hemû hevalan re agahî hat dayîn. Saet didu yê piştî êvarê agahî ji hêla hemû hevalan ve hatibû girtin. Saet çaran, bi operasyona dijmin re, heval ketin pevçûnê. Lê me operasyonê derbas kir. Me nizanibû ku ev operasyona

46

dijmin, operasyonekî berfireh e. Belê bêhayî ji dijminê koremar, me gavên xwe bi bezê diavêt. Me, dest ji plana çalakiya xwe bernedabû. Erê! Em kêliyê bi êrîşê difikiriyan. Beyî agahiya ji berfirehiya operasyona dijmin, saet heftê êvarê em herdu yekîne bi dilrehetiyekî ve bi hêzên xwe re ber bi Çiyayê Reşkê ve ketin nav tevgerê. Hemû heval bi coş û peroşmendiya serkeftinekî din re, di rê de wekî firîşteyan difiriyan.

Rê, bi awayekî hesas û baş keşif nedikir. Haya me ji tevgerê dijmin tunebû, lê dijmin bi hizrê şopa me, operasyona xwe berfireh pêkdianî. Hatina me dîtibûn. Lê bêdeng disekinîn û dengê xwe nedikirin. Ji bo ku hemû nêçîrên xwe di carekî de bi dest bixin. Di wan kêliyan de tarîtiya şevê û bêdengiya xwezayê gelek tiştên dîrokî di hembêza xwe de

vedişart. Kêlî bi kêlî ew dema aloziyê nêzîk dibû. Xweza ji berî kêliya aloziyê ketibû nav jana zarokên xwe. Lê ew jî bêdeng bû. Çiya bi serbilindiya xwe rondikên xwe hîn jî dirijand. Ba, bi senfoniya xwe ve dixwest van zarokên rojê ji aloziye agahdar bike. Lê, ew jî di nepeniya raza xwe de winda dibû. Çimkî ew jî bayê dîroka winda û gelê bênasname bû.
Erê, gav bi gav zarokên rojê, nêzê roja xwe ya dîrokî dibûn. Wê kêliya hebûn an jî tunebûnê bijiyan. Saet ber bi sibeha 3:30 an diçû, ew çembera ku xwediyê taybetmendiyê kêmînên xayîn ya hezar salan bû, niha hêdî hêdî nêçîrên ku li bendê mabû dixist nav qefesa xwe. Yekîneyekî û nîvê yekîneya din, bêhay û gumana vê çember û kemînên xayîn ve ketin nav kêliyê aloziyê. Ji yekîneya me, nîvê hevala ketibûn nav vê çemberê, nivê din jî derveyê çemberê mabûn. Dijmin dest bi êrîşê kir. Em di wê kêliyê de him di nav behitîmayînekî mezin de bûn, him jî bi newindakirina qontrola şer ve di cî de bersiv dan. Her hevalek heta ku hêz û ramana wî têr dikir şerê xwe dida meşandin. Lê amadekariya dijmin ji ber ku gelek zêde bû û bi çekên gelek giran ve êrîşî ser me dikir û yê girîng jî, ji ber ku heval di kêliyekî
47

neamade de hatibûn girtin, dijmin xwediyê gelek avantajan bû. Ew wisa dihesibandin ku gelek hevala bi dest bixin û wan teslîm bigrin. Li gorî hesabên wan gerîla nikaribû li hember ewqas çekên giran û li hember gelek hejmarên leşkerî bisekinin. Li gorî pîvanên wan bi destxistina van

hevalan re viyana hemû gerîla û gelê welatparêz wê bête şikandin. Wê moral û cesareta wan lewaz be û bi vî awayî bi hîn êrîşên din ve him li ser gel û him jî li ser gerîla têkoşîn têkve bibin, qels bikin.
Li hember van heseban, gerîla bersivekî ne di bîr û baweriya wan de bû, da. Heta dilopa xwîna xwe a dawî berxwedan û têkoşîna xwe domandin. Her hevalek ban hevalê xwe ê din dikir û nedixwest şehadeta hevalên xwe bi-bînin. Berî hevalên xwe dixwestin ew şehîd bikevin. Hemû bi yek hestî, bi yek raman, hêz û viyanî, di nav toz, duman û dengê hewanan de li ber xwe didan. Li hember bangawaziya dijmin ku digot "teslîm ol (teslî bibin)" hîn bi xurttir şer didomandin. Bersiva dijmin û li hember koletiyê bi serfirazî şehîdbûn rûmettir dihat dîtin. Dijmin li hember vê berxwedaniyê bi hovîtî diçû ser hevala. Ji wan jî gelek windabûn çêdibûn. Lê, tola her yekî ji zarokên rojê, bi kuştina hezaran leşkeran ve jî nayê hilgirtin. Her yekî wekî mehdiyekî jiyana nû bûn. Ji ber vê yekê, qehremantî û berxwedaniya ku dikirin encax mehdiyê rojê û jiyana nû bikaribûn bikin. Ji sisê û nîvê sibehê heta êvarê şer berdewam kir. Her diçûna saetêkî de dijmin hîn bi harî û hovîtiya xwe ve ji devê xwe xwîn dirijand. Çil û neh ronî, şewqa xwe didan tarîtiya êvarê. Taritî ji beriqandina vê şewqê çavên xwe digirt. Çil û neh can bi vîyanekî bêhempa heta fişekên xwe yê dawî şerê xwe dan meşandin. Lê, wehşeta dijminê ku ji cewherê mirovahî dûrketî xilas nebû. Bi ceset û perçeyên canê bêgiyan leyistin. Êdî rih wan gihiştibûn rojê, di dilê gel û hevalên xwe de bibûn şopa azadî

û xilasiyê. Bibûn sulava jiyana nû.
48

Axîna xwezayê digihişt asîmanan. Dîsa bi xwîna zarokên rojê ve hatibû şuştin. Bi perçeyên canê wan ku hur hurî bibûn, ji nûh de xwe diafirand. Ba, bi bêhnên canên şiwitandî ve bi aramî ber bi zindîweran ve dikete rê. Çiyayê Reşkê di nav wan çiyayên ku hêvî ji rojê digirtin, serê xwe hildabû jor.
Bûyera çil û neh hevala li Çiyayê Reşkê, bûyerekî ku ne pênûs dikarin binivsîn û ne rûpel dikarin têrê bikin. Bûyerekî ku nepeniya dîroka gel û şaristaniyekî dixe nav xwe de ye. Pakrewanên Çiyayê Reşkê bersiva têkoşeneke nû û mizginiya serkeftina jiyana nû bûn. Ceserat, viyan, serkeftin, rizgarî, heskirin û giredaniya azadî û parastina mafê gel, di vê berxwedana bêhempa de bi awayekî zelal dixuye.
Vegotin: Zağros
49

EW ŞEV Jİ BÎR NAÇE!
“Hêviyekî bêhempa dilê wan dagirt. Wan her tişt ji bo hevalên xwe yê birîndar dikirin. Tevî ku hêz bi wan re nemabû jî, lê wan biryara ku; hevalê xwe bighînin şunekî ewle dabûn.” Sala 1995an bû. Kela zereqeyan ya roja Tebaxê zozanên Çiyayê Şehîdan di nava germahîya xwe de dihişt. Apê Hecî ku ev pêncî sal bû dihat serê Çiyayê Şehîdan û nobedariya çilmêrên şehît digirt, destê xwe vekiri bû û ji xwedeya dilovan lava û liyan dikir ku vê şevê kes ji şervanan şehît

nekeve.
Yekiniya Xumaro û Zerzan hatibûn cem hev. Armanca wan; rakirina girê Dûrê bû.
Şervan li pişt gundê Tisê bi cih bibûn. Lê mixabin, di roja dawiya eşkerekirina armancê de cerdevanên gundê Soranser, tîma keşfê dibînin û dijî wan dikevin tevgerê. Di encamê vê bûyerê de hêzên dijmin ji hev bizava şervanan agahdar dibin. Di yekem roja di gulebaran dinê de heval Jiyan pêçiyêkî destê xwe winda dike.
Edî ji vir û şûn ve şer dibû. Du tîm ji bo êrîşê, yek jî ji bo alîkarî kirinê amade bûn. Şervanan tevahî girên bilind girtibûn. Di bernamê de danîna mayînekî du kîlo li ser riya di navbera Durê û Dêmanê jî hebû.
Rojê bi giranî xatir ji gerîlayan û tevahî zindîweran dixwest. Taritî wekî hevalbendekî dibû. Berî her tiştî tîmek mayînên xwe li ser pira Gundê Dêmanê binerd bikirana.
50

Jixwe vê çaxê ji bo rê girtina Zirîpoşa, pêwist bû ku rêkê bigrin.
Derbasbûna katjimêran re koma şervanan li gor hatibû diyarkirin cihê xwe girtin. Piştî ku komên parastinê cihê xwe girtin di nava ronahiya çireyên gund û giran de deste ya êrîşê ber bi hola şer ve ketin rê.
Hevalê bi navê Mahmudê reş, fermandarê deste ya êrîşê bû. Bilalê Ereb, fermandarê koma milê baregehê, Dijwarê Wan ê jî fermandarê baskê milê gund bû. Her komekî êrîşê ji deh şervanan pêk dihat.

Bi kêmayî şêst leşgerên hêzên dijmin di nava çeperên xwe de, destê wan li ser tetîka çekan danî bûn û bi lerizîna çendekên xwe rê li benda êrîşên gerîla bûn. Şervanan jî bi hişyarî hêdîka xwe derbasî qada şer dikirin.
Tevahî şervanan her keliyekî vê şevê, dikirin pênûsek û dilê xwe de bûyerên ku wê biqewimin xêz dikir. Li aliyê din jî niviskar û helbestvan ê gerîla Wasfî (Hemze Yavuz) li cem rêvebirê çalakiyê rawestiya bû. Ji bo ku wê şeva seyr û kesî nedîtî binivse, temaşeyê cihê ku narîncok wê lê biteqe dikir. Gelo wê çawa biteqe? Hestên wan şervanên li wir wê çawa be? Bi vê ponijina heval Wesfî re ronahiyek fireh belavî nava gelî bû. Ev nişana destpêkirina çalakiyê bû. Lê kesî nizanî çawa dest pê bû. Weke çiyayek ji pîzotê agir diyar bû. Mixabin çalakî ne bi narîncoka ku heval Wesfî li bendê bû destpêkir! Bi teqîna guleyekî roketavêja pencî û heftê destpêkir bû. Tarîtiya şevê hol ji jiyanê re nehiştibû. Şerekî bêhempa Çiyayê Zagrosê dihejand. Di heman demê de sterk bibûn temaşevanên destpêbûna şerê vê şevê. Kesî şeveke wisa dojehî, bi çavên serê xwe nedîtibû. Pêwîst bû ku tarîtî erkê xwe li şûna bihişta û rê bida ronahiyê. Bi wê teqînê re jî wisa bû.
Bi vê dengê re şervanan ji du milî ve gir dan ber xwe, bi narîncok û gulebarandinê sing bi sing şer kirin. Di vê keliyê de mirinê jî ferhenga wan barkiribû. Tenê ji binî de rakirina vî girî, di xeyalê wan de bi cî bibû. Biryar dabûn ku vî girî ji
51

nexşeya (xerîta) Mezopotamya yê derxînin. Di nava guleyan

de deng hat;
-Heval Bilal rawest e, tenê neçe.
-Zû werin, zû. Ger em çemberê sist bikin, ew ê me li ber xwe bibin.
Dijwar bi germbûna şer ve ji Şivan re got;
-Şivan em bi hev re herin ser vê sengera pêş xwe û em ên ku tê dene paqij bikin.
Dijwar ku deh çeper rakiri bû, bi hevalê xwe Şivan re hîn bêhtir pêş de çû. Gelek leşkeran xwe di pişta gir de veşartibûn. Lê ji bo me rakirina gir pir zor bû. Tevî vê yekê gelek ji wan jî, xwe ji zinaran de avêtibûn xwar û miribûn. Tenê rêza çeperên li pişt gir li ber xwe didan.
Kesî nizanî bû li ser gir çi qewimiye. Vê çalakiyê wekî şerê salekî dirêj kir. Tenê herkesî dizanî bû ku li wir kuştin pir e û hew;
Hevalê Heval Mehmut;
-Dijwar û Şivan şehît ketin.
Rewş her di çû xirab dibû. Diviya heval Heval Mehmut bi hevalên xwe re maba. Lê her du tîmên êrîşê jî winda dibûn. Hîn wisa bû ji nişkava deng hat:
-Hevalê Artêş gulekî RPG bavêje vê sengera ku MG/3 lê tê avêtin. Pişt re em têkevin êrîş ê.
Êrişê niha sengerên sergirtî bigirta li pêş xwe. Lê diyar bû ku, rewş ne kare serkeftinê bû! Lê êrîş û ji xwe bawerbûyîna Heval Mehmut nedihişt ku paş ve vegerê. Nikari bû ku termên hevalên xwe di nava destê dijmin de bihêle.
Artêş guleyek rokethavêj li nava gir werkir û bi

gurminiya gulê re agir ji nav şervanan belav bû. Toz û dumanê her dever nixumand. Heval Mehmut ê dirêj li erdê bû. Tenê Azad, Artêş û Şervan bi çend hevalên din re, li wir bûn. Heval Mehmut bi dîtina vê rewşê fermanên “paş de kişandinê” da bê ku raweste, Şervan hevalê Heval Mehmut da ser milê xwe û kete rê. Hevalê Doxan Osyan di dema êrî-
52

şê de ji milê xwe birîndar bibû. Êdî tevahî hewildanên wan ji bo gihandina fermandarê xwe Heval Mehmut yê ku cihekî taybet di dilê wan de girtibû bû. Ji bo devereke ewle ji koma heval Mervan ku ew jî ji ranê xwe gule xwaribû, heval derketin. Bilalê Ereb ku ereb ê sêrtê bû, bi coş û heyecana hevalên xwe, bi mêrxasî êrîşê komên leşkerê dijmin dikir. Lê mixabin ew jî di nava barana gulayan de dimîne û şehîd dikeve.
Dijwar fermandarê bi cesaret hevalê şerê giran, keseyeta bi pîvan, çavkaniya şahî û coşî dîsa bi temen ciwan, çeleng û bi kêyf, bi Şivan re mil bi mil êrîşê ser sengerê dijmin diki-rin. Ji ber vê yekê ê en birîndar heval Heval Mehmut jî nikaribûn ji cihên şer dûrbixin. Ên ne birîndar, dest ji şer bernedidan. Li gel vê yekê jî diviya ku berî bibe sibe bigihin pişta gundê Tisê.
Êdî pêwist bû ku ji desteya parastinê henêk biçin alikariya wan. Di taritiya wê şevê de du tîmên parastinê, heval Memo û Welatê Herinkê xwe gihandin tîmên êrîşê. Bi qasî pênsed gavî ji şûna şer bi dûr ketibûn. Lê, pêwist bû lez bikin.

Heval Mehmut nizanîbû çawa birîndar bûye. Bi pêşveçûnê re wî xwe di nava teqînekî dijwar de dîtibû. Di cih de goştê milê rastê tev ji hev bibû û hestiyê ejnoya wî parçe bibû. Ji serê kaba xwe de jî parçeyekî xwaribû û kunekî mezin tê de vekiribû. Di tîma êrîşê de ên ku birîndar nebibûn bi hilgirtina heval Heval Mehmut, ji ên birîndar xirabtir li wan hatibû. Êdî ew jî westiya bûn. Di kêleka rê ve ber bi gundê Dêmanê ve diçûn. Heya gund tev reya katjimêrekî bû. Lê heval Heval Mehmut xwe li ser milan nedigirt. Xwîn mîna kaniyê ji kabok û milê wî diherikî. Heval Mehmut ji ber giraniya êşên birînan, xwe winda dikir:
-Min li vir bihêlin û xwe bighînin hevalan. Hinek av bidin min;
Û peyvên xwe didomand. Lê kesî av nedidayê ji ber ku av vexwarina birîndarekî tê wateya; her tişt bi dawî dibe! Lê
53

heval Heval Mehmut jî ji bo ku hevalên wî xwe xilas bikin, xwe ji pişta wan dixist xwar. Hema di wê demê de fermandarê desteya parastinê, Nazim bi riya cihaza bi têl ve bang kir;
-Heval va ye me hesp rêkir, êdî tu pirsgirêk nema, hesp niha dighên we...
Mazlûm;
-Başe heval, sipas.
Bi vê yekê hêviyek bêhempa dilê wan dagirt. Wan her tişt ji bo hevalên xwe yên birîndar dikirin. Tevî ku hêz bi wan re nemabû jî, lê wan biryara ku; hevalê xwe bighînin

şûnekî ewle dabûn! Hîn ev li ser keviya rê li benda hespê bûn, dumanek, bi teqînekî dijwar re, dol dagirt. Nazim demek dirêj di cihazê de bangkir. Lê Mazlum bersiv nedida. Piştî demekî dîsa dengê Mazlum hat. Ev teqîn dengê mayînekî bû, hevalên ku hesp dianîn, her du çongê xwe winda kiribûn. Herdû hespên din jî reviya bûn. Çavên heval Jiyan, ji ber kel û hilma teqînê şewitîbûn. Tenê heval Mazlum bêbirîn filitîbû.Heval Xelîl ê birîndar hê pêncî gavî nebiribûn, ji ber birîna xwe a giran li ser kêleka rê şehît bibû. Ev car Welat û Memo hêz dan xwe ji bo ku heval Mehmut ji wir dûr bixin. Lê ji ber ku heval Mehmut nediçû ser milên wan û dixwast ku wî bi tenê bihêlin û herin, wan ji biryar dan ku li wir bimînin û gava şer derket herçar heta saxbin wê şer bikin. Lê dîsa jî Memo bi tevahî hêvî û hêza xwe, heval Mehmut hilgirt û bi rê ket. Piştî demekî ji meş, gihiştin daran. Bi bayê bezê, darbestek çêkirin, heval Mehmut bi şutikê li ser darbestê hişk girêdan û riya xwe domandin. Bi lez û bez, bi ronahiya berbangê re, xwe gihandin pişta gundê Tisê. Êdî ew keyfxweşbûn ji ber ku hevalê xwe gihandin cihêkî ewle. Westandina rê tev li hêlêkî û gihiştina wan a cî li hêlek din bû. Di wê demê de doxtor Ernesto jî gihişt wir û di cih de seromek bi laşê heval Mehmut ve girêda. Memo ji keyfa gihandina heval Mehmut

54

û ji mirinê xilas kirina wî, pala xwe da textê reş û di xew re çû. Encamê çalakiyê; kuştina gelek leşkeran bû. Lê mixabin şervanên herî hêja û bi nirx di vê şerî de şehît ketin. Wan heya dilopa xwîna xwe ya dawî, ji bo paşerojekî bi ronî, a-

ram û xweşî li berxwedan. Asîmanên Çiyayên Şemzînan ê, bi stêrkên azadiyê, gerdûn xemilandibû. Her ku canek ji dest diçû biryara wan ji bo têkoşînê bi hêztir dibû. Wê şevê, kese-rek din ya tolhildanê li ba şervanan zêdetir dikir. Lê piştî keliyekî heval doxtor Ernesto destê xwe li milê Memo xist;
-Heval Memo! Ka rabe, hevalê Mehmut şehît ket!
Vegotin: Ziyad Birûsk
55

BİRÎNEK BÊDERMAN
“Min rabirduya xwe tev dikire kûrte sînarîok. Ew bibûn wesiyetê min û tolhildana…”
Sala 1995 bû. Ev sal di gelek hêlan de ji bo me xwedî wateyeke mezin bû. Di wê salê de, dijmin bi gelek rêbazan bi ser me de dihat. Di vê derê de tevlîbûna çetan a şer ji bo dijmin dibû avantajekî. Ji ber ku deverên dijmin nedikarî bighêje, bi rêbertiya çetan re digihişt. Wê salê em yekîneyek gerîla li Mardînê bûn. Hejmara hevalan tev şêst kes bûn. Devera ku ji bo mayînê baş bû hêla Omeriyan bû. Ji ber vê yekê li şûnekî ku jê re digotin cihê yekîneyê, em bi cî bûn. Her di wê demê de, hevalê Kawa yê Mardînê, ku karê quryetî dikir, bi destê çeteyekî hatibû kuştin. Me jî ji bo vê yekê amadekariya çalakiyekî kir. Armanca me, em ji dû hê-lan ve derkevin. Ji hêla yekem, hejmarek heval wê biçûna Mehsertê ji bo kuştina wî çetî, ji hêla din ve, em ê biçûna keşfa çalakiyekî li Mardinê bixwe. Weke her car komcivîna yekîneyê hat çêkirin. Biryara me, sê heval wê biçin ji bo kuştina wî çeteyî. Pênc heval jî di heman roj û saetê de, wê

dest bi keşfê bikiran. Wê demê, gava dengê gulekî dihat, dijmin hêzên xwe dibir devera ku deng jê dihat. Armanca me jî ew bû ku, heya dijmin bi hevalan re mijûl bibe, em jî keşfa xwe bi dawî bikin.
Ji ber ku cihê keşfê zozan bû, em neçar man ku bi hijmarek kêm biçin. Deşta Mêrdîn û çiyayê wê pir ji hev cuda ye. Devera ku em yekîneyek heval lê diman, tev dar û zinarên asê bû. Ji ber vê yekê, dijmin bihêsanî nedikarî ku
56

keysê ji me xweş bike. Ger mirov bêje "xweza mina dayîkan gerîla diparêze, wê ne şaş be.
Piştî amadekariyên çend rojekî, em ketin rêya Mêrdîn û hevalên din berê xwe dan Mehsertê û Mêrdîn heryekî şevekî dûrî cihê ku em lê diman bûn. Ji ber vê yekê hîn katjimêr si-sê yê paş nîvro bû, em bi rê ketin. Em li wir bûn sê grup. Keşfê, me bi rakirina pêdiviyên rê re, çek û rextên xwe hildan û berê xwe dan Mêrdîn ê. Piştî meşa şevekî di deşta Mêrdîn de, em gihiştin rojhilatê bajêr. Devera ku me yê keşf bikira, hejmarek mezin esker û fermandarên dijmin lê diman. Em bi biryar û coşeke mezin gihiştin wê derê. Ji bo me jî di Mêrdînê de çalakiyek pêkanîn, dihate wateya serkeftinek mezin. Qonaxa ku partiya me di wê demê de gihiştibûyê de, ev yek li ser me mîna erkekê pîroz feriz dikir. Gel bi çalakiyên bajara, moralekî mezin digirt. Bi kinasî di bajarekî de çalakîkirin, wateyek xwe ya mezin hebû.
Bi katjimêr sisê yê sibehê re, em gihiştin nêzî bajêr. Ji ber ku deşteke rut bû, me xwe di nava hinek latên mezin de veşart.

Mêrdîn di wê şevê de, mîna ezmanekê tijî stêrk dixuya. Ronahiyên gelek hewş û kolanan, bajêr ronî dikir. Tişta yekem ku em pê rabûn, derxistina nobedarekî bû. Piştî ku me zanî em di devereke ewle de ne, me hinekî bêhna xwe derxist. Ji xwe di heman demê de, her sê hevalên din, karê xwe bi dawî kiribûn. Lê ji ber êrîşa çetan li ser wan, heval neçar dimînin sê çetên din jî ku di nava wan de lawê Hesenê Fermê ê ku li ser çetan rêvebir bû, bikujin. Hêrsê heval ji ber vê yekê neçar dimînin ku di rêyek din re bighên yekîneyê. Dema ku xebera kuştina çetan digihije dijmin, di cî de operasyonê dest pê kir. Êdî dijmin ji her hêlî vê kete nava tevgerê. Ji ber ku em pir nêzî bajêr bûn, me nikaribû di derbarê hersê hevalan de, di rêya cihaz re nûçeyan werbigrin. Tişta ku me sibehê bihîst jî, di rêya nûçeyên radiyo ya dijmin de bû.
Wê êvarê heya sibehê em li nav keviran man. Me her tiştê xwe li gor sibehê amade kiribû. Lê dema em rabûn, em hijmarek esker ku di jor me re derbas bûn, dît. Êdî min û
57

hevalên xwe fêmkir ku li vir jî tevgera dijmin dest pê kiriye. Jixwe devera hatibû diyarkirin ji bo ku em piştî keşfê lê bighên hev, ji êvarî de dijmin pisû lê avêtibû. Ew dever dikete navbera çend gundan û ji wir rê dihat Mêrdînê. Piştî ku me zanî dijmin li wir bi cî bûye, em neçar man ku bi cihazê û li ser xeta giştî bi hevalan re, têkevin pêwendiyê. Piştî bankirina çend cara, hevala bersiv da. Wê gavê wan nizanî bû ku dijmin li wir e. Ji ber vê yekê bi şêweyekî veşartî (şîfre) me got;

-Vegerin.
Dijmin jî dengê cihazê me dibihîst. Wan jî fêmkir ku em di nava wan de ne. Hingî em ji cihê êvarî hatibûn nêzî dijmin bixwe. Piştî pêwendiya me ya bi hevalan re, dijmin li wan deran belav bû. Hevalên yekîneyê ku paş de vedigeriyan, ferman dan ku em jî vegerin. Tevî ku me dizanî vegera bi roj metirsî ye jî, lê hevalan got;
-Hûn zû newin dijmin wê we bibîne!
Ve yekê hişt ku em di wê rojê de amadekariyên vegerê bikin. Her çend min ji hêla xwe de ev ferman rast nedît jî, ez weke taxim qomitaniyekî neçar bûm ku pêk bînim. Di cî de, me rêya xwe girt û ber bi dolekî ve çûn. Pişrtî demekî meş, em gihiştin dola Gozelê ku nêzî Mêrdînê ye. Dol bi qasî 200 metrî fireh bû. Ava ku tê re derbas dibû, ji fabrîqa ya ku li jorî dolê bû, dihat. Av tev ji ber çîmento yê sipî bibû. Di ser avê re pirek hebû. Em pir bi hişyarî ber bi pirê ve diçûn. Armanca me ew bû ku, em derkevin girê aliyê din ê pir ê û di wir e herin cihê xwe. Lê wê kêliyê tenê bi qasî 200-250 metre di navbera me û leşkerên Tirk de mabû. Bê ku em kesekî bibînin, me rêya xwe domand. Hîn em negihiştibûn pirê, hevalekî ji min re bi henekî got;
-Heval Hogir! Ger em li ser vê pirê bikevin pisû yê, em ê çi bikin?!..
Ez bi wî hevalî de acîz bûm. Ji ber ku ev cara yekem bû ku em di nîvro de wisa serbest digerin. Tevî ku tevgera bi roj qedexe bû jî, lê em neçar bûn ku fermana hatiyedayîn pêk

bînin. Em gerîla ne. Ferman ku hatdayîn, çi dibe bila bibe, pêwîste pêk were. Bi roj jî vegera me, sedem ev bû.
Paş kêliyekî ji sekna me ya nêzî pirê, me dest bi meşê kir. Di navbera her yekî ji me de, deh pazdeh metire hebûn. Di xaçerêyekî kêlêka pirê re em dimeşiyan. Di wê kêliyê de hevalê nêzî min got;
-Heval Hogir! Gundiyek li ber wî kevirê hanê heye?
Kevir li nêzî me bû. Min meyze kir ku ne gundiye, eskereke çeka wî li kêlekê ye û difikire...Min fêm kir ku nobedar e. Hema di cî de min rahişt kevirekî ji bo bavêjim hevalê li pêşiya min diçe berî ku deng derxe û esker bi me bibîne. Qet nediket bîra min ku di vê dola nêzî Mêrdînê de pisû hebe. Mixabin, hîn min kevir neavêtibû, hevalê li pêş min, bankir;
-Hûn çima nayên heval Hogir?
Jixwe di deverên wisa de tim gule li ber e. Nexasim, ku em eskeran bibînin. Destê min li ser tetîka sîlaha min bû. Min hîs dikir ku ev ekser nebitenê ye. Ji ber vê yekê min paş te veger baştir didît. Lê dema wî hevalî sedema rawestandina me pirsî, ê esker ku heya wê kêliyê jî heval wisa ji nêzîk ve ne ditibûn, ji tirsa û behitibûnê daxwe û bê ku sîlaha xwe hilgire kire qîr û hewar:
-Terorîst...Terorîst...
Di cî de min fêm kir ku dem derbas bû ji bo xwe xilas kirinê. Gava ê esker kire qîr, min berê çeka xwe dayê û ew da ber gulan. Bi dengê çeka min û ketina esker re, min dît ku eskerên raketî tevan daxwe. Bi kêmayî sîh esker hebûn. Bi vî şêweyî ji xew rabûna wan, tev kirin panîk û hêyecanê de.

Sanî di nav re derbas nebûn, min dît ku ezman bi guleyên wan tijî bû. Ji bo ku nikaribin yekser keysê ji me bînin, min gule li dûv gulan bi hêla wan ve davêt. Vê yekê hişt ku nikaribin ji pişt şikêrê derkevin. Tişta herî baş ew bû ku em li hember hev bûn. Ger ne wisa ba, me nikaribû ku gavekî ji cî bavêjin.
59

Di nava teqe reqa çekan de, ez bi rêya vegerê diponijîm. Lê zêde rê nemabû. Pişta me Mêrdîn e, em nikarin herin. Pêş me esker in. Tenê girêk li hêla din a pirê hebû, ger me ew bigirta, xilasbûna me hebû. Ji bo girtina wî girî min dû heval rêkirin. Heyan hingî jî eskeran keys ji me ne anî bû. Jixwe herdû hevalên li paş min jî xwe avêtibûn erdê û gule bi hêla latê ku esker di piştê bûn, davêtin. Êdî hêviya min ma herdû hevalên ku çûna gir bigrin. Mixabin wan şaş famkiribû û li wir ne sekinî bûn. Di kurtirîn dem de pêwist bû em ji wir dûr bi kevin. Lê di heman demê de, pêwîst bû ku em rê nedin eskeran ku sengeran bigrin. Em man sê heval li wir. Hingî xelasbûn ji bo min rehet bû, lê erkê min ê qomitantî û ji wê zêdetir ê hevaltî û şoreşgerî xelaskirina herdu hevalên din bû. Dema min dît ku du heval ji me qûtbûn û wext jî derbas dibe, min bangî herdu hevalên li paş xwe kir:
-Heval werin....Werin em ê derbas bin.
Lê yek ji herdu hevalan jî ji cî nedaxwe. Hîna min bangî wan dikir, min hîs kir ku destê min tevizî û giran bû. Tevî ku guleya M16 li milê min ê çepê ketibû jî, min qet nizanî bû. Çaxa destê min çek negirt, min zanî ku ez birîndar bûm. Êdî

ji wir û şûn de, hêviya xilasbûn, dîtina hevalan û parastina herdu hevalên bi min re, weke keştiyekî, di deryaya bêdawî de winda bibe li min hat. Wijdanê min mîna girtiyê di nava lepê celadekî de dikire nalenal. Jixwe mirin di wê kêliyê de bibû gerokê nêçîra xwe. Lê ji bo min mirin pir hêsan bibû. Ji ber ku ji her hêlî ve guleyan berê xwe hêdî hêdî didan me. Di wê navber ê de tiştekî pir seyr hat bîra min. Berî ku ez tevlî partiyê bibim min li filmekî Filîstîniyan temaşe kiribû. Di wî filmî de kesê ku rola serekî dileyst navê wî Emîn bû. Emîn jî ji destê xwe birîndar dibû. Di cî de kefiya xwe weke werîsekî bi sukra xwe ve girê dida û destê xwe dixiste xeleka kefiyê de. Min jî bê ku dereng bimînim, wisa kir û çeka xwe danî ser destê birîndar û avêtina guleyan domand. Gelek caran çek ji qontirola destekî derdiket û gule tewş diçû. Di nava vê
60

qelebalixê de, dengê cihazê hevalan dihat. Lê min wext nedidît ku bersiv bidim.
Heya hingî jî, min bang li heval Azad û Çekdar dikir. Lê ne bersiv didan ne jî ji cihê xwe dihatin. Gava min dengê xwe hilda, heval Azad ku ji Misêbînê bû, daxwe û ber bi min ve hat. Hîn heft mitir di navbera me de hebû, heval Azad bêçek ket. Dema min ew wisa dît, min fêm kir ku ew birîndar bûye. Lê min nizanî bê hîn li cihê xwe birîndar ket an jî dema rabû û ber bi min ve hat. Çaxa ket min jê pirsî;
-Heval Azad! Ka çeka te?
-Li şûna min maye heval Hogir.
Piştî ku min baş li heval Azad nêrî, min dît ku ji nava wî

xwîn tê. Min di cî de çentê wî hilgirt û pişta wî da kevirekî nêzî me. Hîn ez bi wî ve mijûl bûm, min guleyek din xwar lê ev car li piyê çepê rast hat û birînek din li canê min vekir. Tişta baş ew bû ku herdu cara jî li goşt ket. Lê a pî, te di got qey agir girtiyê de, ez di cî de pê hesiyam. Hîna hevalê Azad gotinek negotibû guleyek din lê ket û li wir şehîd ket. Bi şehîdbûna heval Azad re min qilêşa xwe da ber serê xwe, mirin ji êsîrgirtinê bi sed carî baştir û pîroztir didît. Min rabûrdûya xwe tev dikire kûrte sînarîok. Ew bibûn wesiyetê min û tolhildana heval Azad. Tenê peyvên minê mayî bi bankirina hevalê Çekdar, ji zimanê min derdiket. Tevî ku xwe kuştin çend caran kete bîra min jî, lê min ji xwe re digot; “berî ez şehîd bikevim bila ez çend eskeran jî bikujim” hîn ez di nava ponijîna xwe de diçûm, min hew dît agir bi pûşê şûna zoman ket. Dûmanê her dever di nava tarîtiya xwe de hişt. Vê yekê hişt ku êdî guleyên eskeran zêde ber bi min ve newin. Dûmanê hinek cesaret ji bo meşê da min. Hema min çeka xwe kir mîna kopalekî û ez li ser meşiyam. Jixwe armanc û hêviya min ne xilasbûn bû. Ya rast min hêza xwe ji bo vê yekê nedidît. Êdî dijmin ez nedidîtim. Bi zorê min xwe ji wê derê dûrxist. Heya ku ez bi ser wan neketim ez nesekinîm. Eskeran jî wisa fêm kirin ku ez jî hatim kuştin. Ji ber vê yekê ew dol bêdeng bû. Tev derketin li ser wan tehtên bilind. Paş bêdengiya kêliyekî, min dengê tarameya heval Çekdar bihîst.
61

Wî jî eskerek li wir kuşt. Hingî di nava wê xwîna birînê xwe de û tevî wê roja zor û zehmet, ken hate ser lêvên min! Bihîstina dengê çeka heval Çekdar hêz û tiwaneyek mezin da min. Min

wisa dizanibû ku, ew jî şehîd ketiye. Lê bi wî dengê re, weke ku mizgîniyek bighe min, ez kêyfxweş bûm. Lê êdî her yekî ji me bi derekî ve direve. Kî wê sax bighê hevalan, kes nizane.
Tevî ku ez jî şûna şer dûr ketibûm jî, lê mayîna cenazê heval Azad xeyal û fikrê min ji wir dûr nedixist. Ew cara yekem bû ku min xwe bêhêz didît ku qîmettirîn tişta li ba xwe ku hevalê min e, li şûna xwe bihêlim, nexasim ew heval şehît ketibe.
Min meşa xwe heyanî ber êvarê domand. Bi qasî kîlomitrekî ez dûrî şûna şer bûm. Devera ku ez gihiştimê de, tev dar bû. Ji dûr ve kesî ez di nav de nedidît im. Piştî çend katjimêrên meşê min kunek di bin kevirekî mezin de dît. Halê min yê meşê, piştî vê roja dirêj, qet nemabû. Devera ku ez lê rawestiyam dîsa li rojhilatê Mardînê bû. Ji bo ku ez hinekî bêhna xwe vedim, min pêşî çenta xwe di derekî de veşart û paşî derbasî wê kûna bin latê bûm. Hingî teng bû, ez neçar mam ku cercûlê çeka xwe, ji ser rakim. Min ew yek jî kir. Ji bo veşartina cihê xwe min çiqilên darê nêzî jêkirin û di devê kûnê de kom kirin. Bi armanca ku kes nizanibe çiqilên darê hîna nû jêbûne û cihê min newe nasîn, min xwe li şûna hatî birîn xist û paşî derbasî hundirê kûnê bûm. Tevî ku min ew der baş veşartibû jî, min pîmê bûmbên xwe û çeka xwe hazir kirin. Li ber ronahiya tava heyvê, min sola tijî xwîna min bûyî, ji piyê xwe derxist û li birînê xwe nêrî. Heya wê çaxê jî min ji ber birînan av venexwaribû. Jixwe gava min baş li çente û cilên xwe nêrî, hingî hijmara guleyên ku li min ketî baş diyar dibû. Çentê min nêzî pazdeh heya bîst kûn lê hebû. Cilên min ji jor heya jêr, ji şûna guleyan kûnî û parçe parçe

bibûn. Tenê şûna ên min hijmartî nêzî çil kûnî bû. Wate çil carî mirinê silav dabû min.
Heya saet yazdê şevê jî ez di bin tehtê de bûm. Gava min dît ku kes nehat û dengê tu tiştî nîn e, ez derketim ji bo baş bi
62

wê deverê ewle bibim. Dema ez derketim ji dervê min dîmenê Mardînê weke ê roja yekem didît. Mixabin, ev car ez bi tenê bibûm temaşevanê wî dîmenê bedew. Heya wê demê xwîn ji birînan rawesta bû, ji bo vê yekê, min tîbûna rojekî bi ava wê deverê şikand. Tevî ku min ew roj bêxwarin derbas kir jî, lê birçîbûn qet nediket bîra min. Tenê kişandina cixarekî ji bo min pir bi wate bû. Lê tûtina min jî nebû.
Piştî ku min hinekî din temaşeyê deştê kir, dîsa ez ketim rêya şûna mayîna hevalan. Lê rêya nîv saetê min bi zorê di çend katjimêran de dibirî. Gava ez gihiştim jortir, min bi ci-haz bangî hevalan kir. Heyanî hingî kesî ji hevalan nizanî bû bê çi bûye. Dema min ban kir, wan bersiv da. Ew jî ji bo me hatibûn nêzî Mardînê. Wê gavê bi tenê vegera nava hevalan ji mirinê jî xirabtir bû. Di heman demê de, pêwist bû ku, tişta qewimî jî ji wan re bê gotin. Ez di nava ponijînê de careke din ketibûm rêyekî bêdawî. Ji ber birînên xwe ez li wir mam. Piştî demekî pênc heval hatin û ez gihandim hevalan. Lê hîn jî heval Çekdar, mîna balindeyekê ji refên xwe qût negihiştibû hevalan min dixwest ku ez bibim çîrokbêjê serpêhatiyên serkeftî!
Lê ev car min bûyerek bi jan ji heval û hogirên xwe re vegot. Bûyerek ku hevalê Azad bi xwîna xwe neqişandibû.

Êdî min zanî ku, ger mirov bibe qurban jî pêwîst e ferman û quralên partiyê çi be, çi bibin wê serpêhatiye ne tenê bandor li ser min kir. Ew bû dersek mezin ji bo jiyana min di nava şoreşê de min fam kir ku ger te kêmasiyek pir biçûk jî xiste destê dijmin de, dijmin te efû nake! Bi serê xwe ew ders bû hêzek mezin ji bo min. Vegera heval Çekdar jî piştî çar rojan li deştê bû keyfxweşiya herî mezin ji bo min.
Êdî min kesayeta xwe ji nû ve, mîna filmekî di berçavê xwe re derbas dikir. Lê heya niha jî, mayîna cenazê heval Azad di cihê şer de, mîna birînekî bêderman di dilê min de cî girtiye.
Vegotin: Hogir Bagok
63

XATİR XWESTİNEK, BÊDENG
"Êdî min jiyan mîna pelek dara payîzê zer û li ber weşandinê didît. Lê tişta ez pê diêşiyam ew bû ku; min nikarîbû peyvekî ji hevalên xwe yên salên dirêj re bibêjim."
Heftanîn qadekê ji hêla gerîla ve xwedî rolekî dîrokî ye. Gava navê Heftanînê di nava gerîla de tê gotin, tê wateya desthilatdariyê û hêz girtinê. Di be ku ev yek, kokên xwe ji dîrokê werdigire. Ji ber ku Heftanîn di dîrokê de bûye şûneke biwate. Li gor gotinên bav û kalan, di serî de Heftanîn bi navekê din dihat nasîn. Jê re digotin; "Tenîn." Tenîna doh, Heftanîna îro, mîna pirekî Bakurê Kurdistan û Başurê Kurdistan bi hev ve girê dide. Ji ber şerê di navbera eşîrên wê demê de, heftanîn dibe du beş. Beşêk li bakur, yek jî li başur. Ên ku beşê başur dixistin destê xwe, ji ber xweşikbûna

xwezaya wê û dewlemendiya di deşt û zozanên wê de, nav lê baştir e. Beşê ku li hêla bakur jî ma, navê wê her ma Tenîn. Lê di roja îroyîn de herdu alî jî bi Heftanînê tên nasîn.
Yek ji çiyayên bilind û bi nav û deng di Heftanîn de, xantûr e. Kî destdane li ser Çiyayê Xantûrê, dikare çar hawîrdor têxe di bin desthiladdariya xwe de. Ji ber vê yekê gerîla di şerê 15 salan de, ev çiya mîna kelehekî ku nakeve, bi kar anîn e û bi xwîna gelek paqrewanan hatiye xemilandin. Çar hawîrdor ê Xantirê, mîna gerdena bûkekî xemilandî ye. Ji hêla bakur ve Geliyê Pisaxa, ji hêla başur ve bajare Zaxo heye. Bi şevan bilindahiya çiyan, Zaxo û Xantir ji hev cuda dike. Li rojhilat a Xantûrê, Gundê Banikê û
64

Kelha Şabanîkê hatine avakirin. Kelha Şabanikê xwedî dîrokeke kevin e. Ew keleh navê xwe ji navê "Şahê Banikê" werdigire. Wate "Kela Şahê Banike" ji hêla rojava ve çiyayê Cudî jê ve xuya ye. Mirov her sibeh bi tîrejên şefeqê re, bilindahiya Cudî dibîne.
Belê, Gulana 1997 an, em di nava vê xwezayê de bûn.
Ew bi salan bû ku heval û hogirên me ev erdnigarî mîna rûniştgehekî bi ewle didan bi kar anîn. Em ne yên destpêkê bûn ku li vir diman, ne jî ên dawî bûn. Bi serdeman bav û ka-lên me di nava wan zinar û daristanê wan çiyan de bi cî bibûn, şer kiribûn û çiyayên mîna Xantûrê bibû meydanên cengê ji bo cengawerên Kurd. Paş salên dirêj gerîla ji bo vegerandina hêviyên wendayî, li wan deran bi cî bibûn. Dijmin jî mîna ku di dîrokê de gelek caran ew çiyayên

bedew kiribûn gora mêrxasên Kurd, dixwest ku me jî li wan deran tûne bike. Lê ev car çerxa felekê ne bi daxwaza wan digeriya. Ne jî şervanên kurd mîna en berê bûn. Êdî hesabê sûk û malê li hev nedihat. Dijmin bi hêviyek êrîş dikir, lê bi zorê xwe xelas dikir. Wê sala ku em li Xantûrê diman jî, gelek caran em rû bi rûyê êrîşên dijmin diman. Cara dawî ku em di nava pevçûnê de bûn, 14 ê Gulana 1997 an bû. Wê rojê dijmin bi hêzekî mezin dest bi paksaziyê fermanên amadekariyên li dijî paksaziyeke dirêj dabû. Wisa hatibû di-yar kirin ku ev êrîşa dijmin û paksaziya wan, wê şeş mehan dirêj bikirana. Yekîneya me jî, xwe parastin ji her hêlî ve ki-re armanc. Ji bo pêşîgirtina zinarên zêde zêde tirî, hevalên me di ber pala Çiyayê Xantûrê de bi cî bûn. Me tevahî hewildanên xwe ji bo ku dijmin me nebîne, bi kar dianîn. Kêmasiyên me ên serekî, di hêla xwarin û vexwarinê de bûn. Tenê kîsek şekirê me hebû, mixabin ew jî di sê rojên şer de bi dawî bû. Me di çend rojên destpêkê de, tevgera dijmin şopand. Ew ji katjimêr 4 ê sibehê heya 12 yê nîvro di geliyan de diman. Ji nîvro û şûn ve, hildikişan girên bilind. Me heşt roj bi xwe veşartin û şopandina tevgera dijmin derbas kir. Lê ji ber ku bi dawîbûna xwarin û vexwarina me, biryar hat
65

girtin ku neh heval biçin hinek pêdiviyan ji Geliyê Pisaxa ku şûna veşartina pêdiviyên me bû, bînin. Paş amadekariyan, bi katjimêr yek û nîvê paş nîvro em ji ber pala Çiyayê Xantûrê bi rê ketin. Di navbera cîyê me û Gundê Perex de ku di Geliyê Pisaxa de bû, nîv katjimêr hebû. Di rê de em bi

hişyarî diçûn. Bi her gav avêtinekî re, me li dora xwe dinêrî. Bi baldarî me destê xwe jî çeka xwe venediqetand. Di meşa xwe de, me gavên xwe bi îhtîmala derketina eskeran davêt. Bê ku tu tişt biqewime em gihan Geliyê Pisaxa, nêzî Gûndê Perex. Di cî de min û hevalê Şiyar, ard derxist û dest bi hevîrkirinê kir. Hevalên din jî bi karên din rabûn. Çemê ku di gelî re diherikî, hingî baş û xurt bû, kesî ji dengê xûşêniya wê, dengê kesî nedibihîst. Heya gelek caran hevalan bi dengekî bilind bang li hev dikirin. Hîna deh deqe di wê navê re derbas nebibûn, min dît ku hevalê Şiyar tevgerek dikir. Di cî de min bang lê kir:

-Heval çi bû? Tu çima wisa tevger dikî?

Dema wî bersiva min ne da, min bi hêla ku wî meyze dikir ve serê xwe zivirand. Wê çaxê min dît ku esker û pêşmerge mîna moriyan ber bi me ve tên. Ew pir nêzî me bibûn û ji bo ku em xwe bidin dest, bang dikirin. Heval Cengawer ku yek ji hevalên bi me re bû, ji bo ku em xwe bi cî bi kin herdu destên xwe hildabûn. Leşkeran wisa fêm kirin ku, ew xwe dide dest. Lê heval Cengawer ji bo me wisa dikir. Di cî de min destên xwe ji nava hevîr derxist û rahişte çeka xwe. Jixwe gule tim li ber avêtinê bû. Hîn wisa min berê çekê da koma leşker û pêşmergan. Tişta ku min dît, bi gule barandinê re, çend leşker û pêşmerge ketin. Lê bi sedema rastbûna cihê min, min xwest xwe di paş kevirê nêzî xwe de veşêrim. Hîna min xwe nezivirandibû, guleyek li çena min ket. Bi qasî çend saniyan ez bêhiş ketim.

Piştî ku min çavên xwe vekirin, min dît ku mîna ewrek taviya destpêka biharê gule di ser cihê me re dibûrin û

dibarin. Wê çaxê her heşt hevalên min ketibûn nava şer de. Dema min da xwe ku ez bimeşim, hêza min bes nebû. Tenê
66

min dikaribû ku xwe bighênim paş wî kevirê nêzî xwe. Dema ez li paş kevir rûniştim, ez ketim nava deryaya xeyalan de. Ez ditirsiyam ku dijmin ew hevalên din şehîd xistine û canan parçe parçe kiribe. Hovitiya dijmin tu carî jibîr nediçû. Me dizanibû ku gava gerîlayek birîndar, an jî şehîd bikeve destê wan, her şêweyê karên kirêt û pîs, bi wan dike. Ez gelek caran bibûm şahîdê wan dîmenên bi jan ên hevalan. Min mîna wan dîmenan di tu filmê tirajîkî de jî nedîtibû. Hîna ez di nava xeyalên xwe de bûm, ji nişka ve, dengê çekan rawestiya! Dîsa dengê çem di gelî de bi tenê dengveda. Rawestandin dengê çekan ez careke din xistim nava fikarên bêqirax de. Min êdî dest da xwe ku hevalên xwe yê rojên xweşî û nexweşiyan, hevalên ku em bi salan li ba hev bûn, hevalên rojên kêf û ên xemgîniyê meyze bikim. Gava min serê xwe hêdîka ji paş kevir derxist, ji nû ve xûnçeyên hêviyê di dilê min de bişkivîn. Ji nû ve sûlava key-fê bi ser lêvên min re hate xwar. Min dît ku hevalên min yek bi yek bi ber min ve tên. Dema ew nêzî min bûn, ez pir dilşa bûm. Wan bi dîtina sikûr û singa min a bixwînê hatiye pêçan, zanîn ku ez birîndar bûme. Lê ji ber ku pir xwîn ji birîna min daketibû, wan nizanî bê ez ji kû derê birîndar ketime. Ew li hember min rawestiyan. Hingî tevî hewildanên min jî, min nikaribû ku peyvekî jî ji wan re bêjim, ne jî şûna birîna xwe bilêv bikim. Tenê bi destê xwe dixwest bêjim;

-Heval dest ji min berdin û xwe xilas bikin.
Lê qerîna heval Laleş, mîna erdhejekî di asta herî bilind de ez hejandim:
-Heval! Va hevalekî birîndar li vir e, em wî jî bi xwe re bibin.
Heya wê kêliyê tu tişt ji hevalan pê ve nedikete bîra min. Lê qerîn û giriyê hevall Laleş mîna defa hewarê di guhê min de dengveda. Tenê bi wê hewarê min xwe mîna zarokê bi çalepkan xwe dixişkîne, dît. Heya hingî birîna min nediket xeyalê min. Lê niha, weke ku teze gule li min bikeve, min destên xwe yên di nava xwînê de sorbûyîn, danî ser birînê
67

xwe. Êdî xwe mîna barekî li ser milên hevalên xwe yên di şer de didît. Bi wê qîrê, min xwe weke nêçîrekî li ber mirina ku her kêlî bi bûxçika xwe ya sipî re, li wir digeriya, hîs di-kir.
Hevalê Cengawer ku yê dawî bû, ez dam kêleka xwe û em bi hev re meşiyan. Jixwe hêza meşê jî bi xwîna birînê re, ji min dûr ketibû. Tevî wê yekê jî min gavên xwe ber bi pêş ve davêtin. Ji bo ku şopa me bi xwînê newe dîtin, min destê xwe dikirin mîna kovikekî û her ku dibû xwîn, min dirijand û qûma Xantûrê bi ser de dikir. Lê xwîna ku mîna berfa vê mehê dibû av û bi latan de diherikî. Hingî diçû hêza min a meşê ji min distand. Piştî kêliyekî ji meşê, min hew dikarî ji cî bilivim. Ez li ber darekî ku ava berfa vê mehê tînê wê, mîna şikeftekî kolan bû, rawestiyam, min biryara xwe di bin darê de veşartinê da. Mixabin guleya ku li min ketibû, ziman,

qîr, axîn û keser ji min sitandibûn. Mîna zarokê ku hîn zimanê wî li ser peyva “dadê” venebibû be, li min hatibû. Êdî her xwestekên min, her peyvên min, bi destên ji xwînê, mîna hineya roja zemawendê sorbûyî wer xwest ku, min li wir bihêle û biçe. Tevî ku min bi ziman jî jê re ne got, ew tê gihişt ku ez çi dixwazim bêjim. Lê wî destpêkê çûna bê min û hiştina min a li wir, nepejirand. Mixabin hêza min ya meşê nema bû. Jixwe mayîna li wir û şehîdketin tevahî xeyalê min dagirtibû. Êdî min jiyan mîna pelekî dara payîzê zer û li ber weşandinê didît. Lê tişta ez pê diêşiyam ew bû ku, min nikarî bû peyvekî ji havalên xwe yên salên direj re bibêjim. Min gelek caran ji xwe re digot: “Ger ez şehîd bikevim, bi kê ma-yî ezê tiştên di dilê xwe de berî şehîdbûnê bibêjim.” Lê niha gava ku birîn bûye bendavek li pêş pêlên peyvan, gava ku tevahî gotinên ferhenga temenê min, li ber lêvên kilîtkirî sekinîne, ez xatir ji hevalê xwe dixwazim bê ku tu tiştî bêjim. Gotinên dawî ên ku her mirovek berî mirinê dibêje jî, min nikarî bû ku ji hevalê Cengawer re bibêjim. Tenê bi çavên xwe yê tijî rondik û bi kovaniyê rûçikên xwe, min xatirê dawî dixwest û dilê min dibû keştiya peyvên min ê ku dibûne 68

kul û derd di deryayek bêdawî de. Ji ber ku min hêvî ji jiyanê qût kiribû, min çek û rextê xwe da heval Cengawer. Tenê bombeya ku heval Cengawer bi destên lerizî dayî min, li ba min ma. Min ji xwe re digot; “Qet nebe bila çek û rextê min nekeve destê dijmin de.” Gava ez derbasî hundirê wê kuna binê darê bûm, bi awira dawî min xatir xwest. Heval

Cengawer jî piştî hembêz kirina rûçik û canê min ê di nava xwînê de mayî, bi rondikên qûtbûna ji min, hinek pelên darê, ji derve de danîn ser devê kûnê. Wê çaxê bi danîna pelan destê wî direcifî. Çav tijî rondik bibûn. Min di nava rûyê wî yê kovan de, qûtbûna ebedî didît. Ji ber vê yekê heya li wir bû, me destên hev diguvaşt û bernedida. Te digot qey heval Cengawer ji ser gorekî radibe, wisa hêdî da xwe. Pelên darê jî li ber çavê min dibûn gulên ku li ser goran tê danîn. Ji wir û şûn ve, êdî ez û rêhên dara ku bûyî parezvanê min, bi tenê man.

Dengê eskeran, her ku diçû nêzîktir dibû. Wan dengan hişt ku bombeya heval Cengawer ya ku bêdilê xwe dayî min, têkve tevgere. Di cî de min pîma wê ji bo kişandinê amade kir û danî kêleka xwe. Lê ji ber ku xwîn ji birînê ranediwesta, min awêne ya xwe derxist û lê nêrî. Bi parçe şûtikekî min xwest ku guleyê ku xwîn jê dihat, bigirim. Wê çaxê min kesekê nû di awêneyê de didît. Çena min bi hêlekî din de xwar bibû. Min diranên jor ji ên jêr, nedinasîn. Dema parçe ya şûtikê di şûna birînê de bi cî bû, damar li hestiyan ket. Wê çaxê ji nû ve êşê dest pê kir. Bi tevzînkên canê min re, ez ji ser hişê xwe çûm. Bi qasî 30 deqî ez wisa bêhiş mam.

Gava ez bi xwe hisiyam, wê çaxê dengê leşkerên dijmin her ku diçû dûr dibû. Min fêm kir ku êdî bi şûn ve diçin. Wê çaxê saet bibû çarê ber êvarê. Di wê navberê de, dengê hevalê Sînan û çend hevalê din hat. Jixwe wan hêviya xwe ji mayîna min ya jiyanê birî bûn. Hevalên ku ji min cuda bibûn jî, gotibûn ku heya niha jiyan nake. Ew kî ba jî, ku rewşa

min bidîta bawer nedikir ku ez jiyan bikim. Hevalê Sînan û
69

hevalên din jî, nehatibûn ku min bi saxî bibînin, wan xwe amade kiribûn ku, cenazê min ji wir derxin û bibin ba hevalan. Ji ber ku ez wê çaxê nû hatibûm ser hişê xwe, ez wisa têgihiştim ku min di xew de heval Sînan dîtiye. Lê gava xiş xiş ji jor hat, min di nav pelan re li jor nêrî. Wê çaxê sîmayê heval Sînan ket ber çavê min. Wê çaxê qîra min, bibû mîna nal nala zarokekî di pêçekê de. Min di cî de destê xwe ber bi jor ve paland û çîlo da aliyekî. Hevalê Sînan ku hatibû cenazê min bibe, ji dîtina min bisaxî bawer nekir. Hema bê ku raweste bi hevalên din re ez ji wir derxistim û çena min baş pêça. Wî dît ku sînga min tev bixwînê sor dike. Di wê demê de min bi destê xwe, jê re nîşana "yek" da diyar kirin. Wî fêm kir ku tenê gule yek li min ketiye. Çavên heval Sînan tijî rondikên şadiyê bibûn. Jixwe mîna ku heval Cengawer ji min qût bû bê ku peyvekî ji min bibhize, heval Sînan jî ez dîtim bê ku peyvekî bibhîze. Min bi bêdengî xatir xwestibû, niha jî bi bêdengî xêrhatin li hevalên xwe dikirim.
Vegotin: Rêber Qamişlo
70

ME BÊŞER HÊVİYA
XWE PARAST
"Ji bo ku girîn û nexweşî ne be şensê nivşên pêşerojê jî, me çek hilgirtibû. Niha jî ew şaşitî bûba emê ketiban çi rewşê?" Wê çaxê tevahî beko, diketin nava tevgerê û dixwestin

ku me û rojê, ji hev cuda bikin! Wê çaxê jiyan bibû bêjingek, baş û xirab, rast û derew, ronî û tarî ji hev dida cuda dikir. Êdî her tişt zelal bû. Neviyên Zerdeşt, “baş diramiyan, xweş dipeyviyan û rast pêkdianiyan!” Ên din jî mîna gurên çavsor û birçî dixwestin bi me xuriniyê xwe bişkînin. Lê gava destê wan negihişt van çiyan û bi me nikarîn, xwestin rojê ji me dûr bixin. Di wê rewşê de herkes, bêdeng bû. Rojava şerim nedikir! Ji bîra wê çûbû ku şaristaniya xwe ji ku girtiye. Saziyên mafê mirovan, li biryarên xwe poşman bibûn. Ew jî mîna afranderên xwe, bibûn bazirganê canê zarokên şaristaniya rojhilat! Lê wan nikarî vî karê bigemar bighînin dawî. Bi sedan zarokên rojê, xwe dişewitandin û dibûn xelekek ji agir li dora roja rojhilat. Piştî roja reş (15 Sibat) herkes li ser piyan bû. Her yekî li cihê xwe tol ji rûreşan distand.

Wê çaxê, wate sal 1999-meha Nîsanê, em li Zapê bûn.

Wê demê biryara çalakiyên tolhildanê hate wergirtin. Ew çalakî ên yekem bû ku wê di biharê de bihata kirin. Heya hingî jî ez beştarî nava şer nebibûm. Jixwe paş 15 Sibatê hêrs û kîna me gihiştibû astekî herî bilind. Her yekî di dehma xwe de, xwe ji bo tiştekî ku pê bikaribe dilsoziya xwe bi Serokatiyê re bide nîşan, amade dikir. Jixwe ji bo min

71

beştarbûna nava şer di vê demê de xwedî wateyek pir cuda bû. Ji hêlekî ve heya hingî ez tevlî tu çalakiyekî nebibûm ji hêla din ve her tiştê ku dihat pêkanîn, ji bo tolhildanê bû. Ji her hêlî ve tevlîbûna min a vê demê, watedar bû.

Amadekariyên yekîne ya me, ji bo êrîşkirina li ser erebeyekî çetan bû. Şûna ku êrîş wê lê bihata kirin, di navbera Zap û Metîna de bû. Jê re tê gotin “Amediye, Gundê Fileha.” Ew dever dikete sê koşeya Zap, Metîna û Garê de. Herkes ji bo wê rojê bêsebir bû. Pêşî hevalan ez tevlî guruba êrîşê nekirim. Wan hîna ez nû didîtim. Lê ji ber israrkirin û gerimbûna mîn a ji wî şerî re, hevalan tevlîbûna min a wê çalakiyê pejirand. Zor û zorahiyên rê û çalakiyê tev li hêlekî bû, tevlîbûna min a yekem çalakî di jiyana xwe de, li hêlek din bû. Baweriya ku hevalên yekîneyê didan min, moralê min hîn behtir bilind dikir. Êdî her tişt ji bo min bibû ew roj. Bendewariya roja çalakiyê roj li ber min dirêj dikir.

Berî roja çalakiyê, komcivîna me ji hêla hevalê Dijwar ve hat lidarxistin. Şêweya çalakiyê bi êrîşa du hevalan û parastina sê hevalan re hat zelal kirin. Her pênc hevalan ji bo ku çalakî serkeftî bi dawî bibe, çekên xwe ceribandin. Êdî em amade bûn. Ji ber ku şûna çalakiyê ji me dûr bû, pêwist bû ku em berî wê bi çend saetan bi rê bikevin.

Piştî amadekariya, em saet çarê ber êvarê ji noqta Şehît Qehreman ku li jêrî girê Hekkarî bû, derketin. Mîna evîndarê ku bi ji wan be û biçe jiwangeha xwe, her gavekî min davêt, min xwe nêzî hêviya xwe hîs dikir. Bi şevê re em gihiştin nêzî Gundê Filehan ku girêdayî Amediyê bû, li nêzî rêya ku ji Amediyê tê wî gundî, me keşifa xwe kir. Heya wir jî her tişt serkeftî derbas dibû. Derdorê me tev girên bilind bû. Tenê dolek hebû ku ji bo di rewşek nebaş de mirov paş de vegere.

Li gor nûçeya ku gihiştibû destê me, erebe wê saet 11

bihata. Berî wê bi saetekî her yekî ji me cihê xwe girt. Di jarjulê çekê me gişan de, guleya ku li destpêkê bû, ji ên din tevan şanstir bû. Ji ber ku a pêşî ew dibû pênûsa ku dest bi
72

xêzkirina vê şevê bike bû. Bi cî girtinê re, rext û çekê me, di ber milê me de bi cî bûn. Her yekî ji me, bi hişyarî tiliya xwe ber bi tetîkê ve bir. Êdî berê çekan tev li rê bû. Katjimêra bêsebiriya me, mîna gûrekî bi dûv katjimêra jiyanê ketibû û jê dixwest ku zû bimeşe. Gava wexta diyarkirî hat em tev amade bûn, lê erebe nehat. Em qederek din li wir man. Mixabin bêfeyde bû. Wê şevê erebe derbas nebû. Tevî wê yekê jî min hêviya xwe qut nedikir.
Dema ku erebe nehat, me rê girt û biqasî sê saetan bi girekî ve hilkişiyan. Pêwîst bû ku kes me li wir nebîne, ji bo vê yekê me ew şev li girekê bilind, ku jorî rê bû derbas kir. Me her pênc hevala ku em didu keç bûn û sê xort bûn, me ew şev li wî girî derbas kir.
Lê ji bo ku kes me nebîne, em sibehê heyanî saet çarê pişt nîvro li wir man. Di hêlekî de me bêhna xwe vedikir, di hêla din de, me li ser çalakiyê dan û sitandin dikir. Heyanî piştî nîvro em li wir man. Gava dema pisû avêtinê hat, me xwe berda nêzî rê, cihê ku roja berê em çûbûnê de, wê çaxê mîna zarokê ku li benda roja cejnê be li min hatibû. Her kêliyekî dibû sal li ber min. Tevî ku di şer de şehîtbûn jî heye, lê keyfxweşiya çalakiya yekem, tevahî tirs û guman ji min dûrxistibûn.
Dema me cihê xwe girt, me dît ku du gundiyên jin li jêrî

me ne. Bêhnek di wire derbas bû didu yên din jî gihiştin wan. Wê gavê em tirsiyan ku çalakî eşkere bibe. Ji bo ku gundî me nebînin, me xwe veşart. Em li benda wan man ku biçin, lê belê, wan sifre li wir danîn û dest bi nan xwarinê kirin. Gava me dît ku wê dereng bimînin û ji bo komkirina kerengan hatine vir, du hevalên me çûn ba wan. Ji ber ku baran bariya bû, em ditirsiyan ji bo ku bizanin em ka li kû ne, şûna piyên me dîtibin û hatibin. Lê piştî demekî ji mayîna herdu hevalan, û vegera wan gundiyan hin tiştên nû gotibûn! Armanca me ew bû ku em êrîşî ereba çeteyekî ku roleke mezin di şerê li hemberî partiyê de dileyst, bikin. Lê tişta ku gundiyan gotibû, ez di cî de behîtî hiştim. Ger wê çaxê kêrek

73

li min biketa, belkî dilopek xwîn ji canê min nehatiba. Wê gotina gundiyan ji hêlekî ken anî li ser rûçikên min, ji hêla din ve destê min ê ku çek hildigirt weke pela dara li ber bayê bihêje, wisa lerizand. Wan gundiyan ji hevalan pirsî bûn:

-Ma hûn ci dikin?

Hevalan:

-Karê me heye! Lê em dixwazin bipirsin: ereba mirovekî dewlemend di vê rêyê re derbas dibe, ma kengî tê?

-Ereba ku hûn qal dikin sibehê derbas bûye, lê a ku wê gavek din derbas bibe, ew jî mîna wê ye. Lê ne a wî zilamî ye!

Heval:

-A kî ye?

-Ew ereba ku niha derbas bibe, a zarokên bêdê û bav in!

Jinek dewlemend wan xwedî dike û her roj wan dibe mala xwe û vedigerîne şûna xwedî kirinê!
Ew ereba ku ev du roj bûn em li bende disekînin, ne ya ê çete bû. Dema min ev yek bihîst di cî de min ji hevalên xwe re got:
-Hevalno baş bû me doh bi şev li erebê nexist! Ji ber ku ereba wan zarokan jî, li gor ku gundiyan gotibû, bi şev derbas bûye. Wê gavê min xwe mîna herî mirovê bişens di vê dinyayê de hîs kir. Ger me wê şevê êrîş bikira û ew zarok tûne biban, heya henaseya dawî a jiyana xwe, minê êşa wijdan bikişanda. Mane em bi xwe ji bo ku zarokên vî welatî bi aramî û azadî bijîn derketin serê çiya. Ji bo ku girî û nexweşî ne be şensê nivşên pêşerojê jî, me çek hilgirtibû. Niha jî ku ew şaşitî bûba, emê ketiban çi rewşê? Ew çalakiya yekem bû di biharê de! Ew çalakî bi tunebûna wan zarokan bi dawî biba, min tu car xwe efû nedikir. Lê piştî me zanî ew ereba zarokên yetîma ye û me erîş nekir ser, min ji hevalên xwe re car din got:
-Yekem çalakiya di jiyana min de, bi serkeftinek herî mezin derbas bû!
74

Erê! Ew çalakiya ku gule tê de neteqiya, serkeftina herî mezin bû di temenê min de. Wê çaxê tevahî gotinên Serokatî ên di derbarê zarokan de, di hizirê min de yek bi yek derbas dibûn. Di vî welatî de tişta herî binirx şehîd û paşî jî zarok in ji bo Serokatî. Niha jî hindik mabû ku em wan firişte yên bêtawan bi destê xwe bikûjin.

Hin ez di nav kêyfxweşî û hizirinê de bûm, erebe hat. Lê ev car hevalan ne bi çekan bi ken û şadî pêşwaziya wan kir. Gava em ji rê dûr diketin, her min li paş xwe dinêrî. Ew rê, ew dever bibû kaniya coşiya min ji wê rojê û şûn ve. Ne tenê ez, her çar hevalên min ji min keyfxweştir bibûn. Tevî ku min ew zarok nedîtin jî, lê ew heya niha di dilê min de cih digirin. Her çend ew çalakî heyf hilandin bû jî û me nekir, lê mayîna wan zarokan li ser rûyê vê dinyayê bi serê xwe tolhildana herî mezin bû dijîm.

Vegotin: Sêal Dêrikî

75

SOZ Û PEYMAN

Dİ RÊYA WAN DE

“Lê her çiqas leystikekî bi vî rengî li ser me dileyîstin, ewqas hêrs û kîna me jî li hember wan zêde dibû û me dixwest di demekî kurd de wana ji vê herêmê dûr bixin.”

Ji heyaman bihar, ji mehan Gulan bû. Meha dawî a biharê. Giya û kulîlkên çiya deşt û zozanên welat her roja ku derbas dibû ber bi çilmisînekî ve diçûn, kanî û rûbarên welat jî ber bi zuhabûnê ve….Dawiya bihara sala 2000 an, ji rojan rojeke germ û xweş bû. Serê sibehê dinya sayî, asîman ji asoyekî heyanî asoya din tev de şîn bû. Rojê ji rojhilat ve tîrêjên xwe li ser xuyangên welat direşand, li ser kanî û rûbaran beriqandineke bêhempa dida çavên me. Ji dûr ve dengê qebe qeba kewan, ji nêz ve jî dengê çûk û bilbilan tevlî dengê şireşira ku ji herikandina avê derdiket, dihat gohên me, hestên me ji xewa hênkayiya serê sibehê hişyar

dikir, xweşî û şadî dixist nava dilên me.
Em bistûpênc yekîneyên fîdaî li herêma Kelatuka, di bin siya kendal û hendefan de bi cih bibûn. Meha Avrêlê bi dawî bibû. Di dawiya her mehekî de civînên bi navê civîna mehane dihat li dar xistin. Îro jî, ji bona hevalên ku di yekîneyê de cihê xwe digirin kom bibûn û nirxandina reng û rewşa jiyana meha Avrêlê ku derbas bibû, dikirin. Rexnedayîn û rexnekirina vê mehê tev di wî rojê de tên kirin û jiyan tê sererast kirin, kêmasî û qelsiyên tên jiyankirin bihêz dikin û rê û rêzanekî ji nû ve didin jiyanê.
76

Demekî dirêj bû ku em di civînê de bûn. Dema me navber da civînê, di navberê de hin hevalên rêvebiriyê kom bibûn û di nav xwe de nîqaş dikirin. Ji libat û tevgerên wan dixuya ku rewşekî neyînî dihat jiyan kirin. Bi livên dest û rûyê xwe li der erdnîgariya Kelatuka gotûbêj dikirin. Navber deh deqe berdewam kir. Civîn ji nû ve dest pê kir. Piştî ku tevahî heval ketin cihê civînê, bala min kişand ku hevalê Selman tevlî civînê nebibû û derketibû cihekî bilind, bi laserkê diaxifî. Piştî ku hevalên dîvanê derbasî cihê xwe bûn, hevalê ku platform berhêlî dikir bi dengekî bilind axifî û got:
-Hevalno! Pêşmergeyên YNKê bi hêjmarekî zêdê derûdora Keletuka dorpêç kirin e. Bila her hevalek di bin venêra yekîneya xwe de kom bibûn. Armanca YNKê gelekî berfireh û leystîka ku dileyst jî gelekî qirêj bû. Dixwest, ji Zelê heyanî Kanî Cengê têxe bin venêra we. Lê belê, di van

araziyan de cihê stratejîk tev de di bin venêra me de bû. Di destpêkê de me leystîka YNKê baş fêm nekiribû ku dixwaze çi bike. Dema wan derdora herêma ku em lê diman dorpêç kirin, me jî tedbîrên xwe yê şer girtibû. Nêzikî du mehan bi vî awayî hat derbas kirin. Piştî demekî kin me armanca wan fêm kiribû. Dixwestin ku bi awayekî me bixapînin û ji vê herêmê derînin. Leystîka wan ê qirêj derketibû ser rûyê avê. Lê, ma nizanibûn ku vê xakê bi fêlbazî, xapandin û hileyan nikarin ji me bigirin! Ev xaka ku bi xwîna dehan hevala hatiye avdan û ji êş û jana kişandibûn qelîştek tê de çêbibûn. Kanî û rûbarên wê tev ji stêrk û rondikên çavên dayîkên dilşewat bû û ji bo vê yekê me weke dayîkan hembêz dikir. Ev der warê şehîdan û çavkaniya jiyana me bû. Ma hêj fêm nekiribûn ku derketina me yê ji van xakan wê ne bihêsanî be û heta dilopa xwîna me ya dawî me yê li ber xwe bidana. Têgihiştina leystoka wanê qirêj û sivik zêde ne zehmet bû. Dixwestin hêzên me yê li van herêman tev de li Dola Kokê kom bikin û di zivistanê de êrîş li ser me bikin û me tûne bikin. Lê bi serketina van leystokan ewqas ne hêsan bû. 77

Ji ber vê yekê jî çi rê û rêbazên qirêj hebûn, hemû li hember me bi kar dianîn. Hevalên me yên ku li nava gel, xebatên rêxistinî dikirin tev de ji aliyê wan ve dihatin girtin, binçavkirin û di cizaret û şikenceyan de dihatin derbas kirin. Dîsa li çiya êrîş anîn ser me û rêyên me yê lojîstîkê asê dikirin û nedihiştin ku em pêwîstiyên xwe pêşwazî bikin. Dîsa, tîmên kontra ku her şevî êrîşên tacizî li ser me dikirin,

dixwestin baweriya me bişkînin û me ji vê herêmê derxînin. Lê her çiqas leystikekî bi vî rengî li ser me dileyîstin, ewqas hêrs û kîna me jî li hember wan zêde dibû û me dixwest di demekî kurd de wana ji vê herêmê dûr bixin.
***
Kela rojekî ji rojên havîna germ bû. Êdî çiya û kulîlk tev de hişk û zûha bibû. Gelek kanî û rûbar çikiya bûn. Guleyek, çirûskekî agirê an jî perçeyek şûşe pir bi hêsanî dibû sedema şewitandina wî çiyayê hişk, darên çilo û maziyan. Jixwe piştî her pevçûnê agir bi van araziyan digirt û ji ber derfetên tefandinê tunebû, ev agir bi rojan berdewam dikir. Yekîneya ku ez lê dimam û yê ku heval Selman lê dima, ji hev cuda bûn. Lê ji hev jî zêde ne dûr bûn. Rojek ji van rojê havînê yê germ, hevalê Selman hat ba min û got:
-Ji bona çûyîna peywirekî, ez û tu hatin erkedar kirin.
Min ji bo te jî destûr girtiye.
-Hevalên me yên stî, çar pêşmergeyan dîl girtine.
Pêwîste em biçin wana bînin vê derê.
-Baş e. Li benda min be heya ku ez çeka xwe bigrim û bêm.
-Zû were ha. Ez li vê derê li benda te me.
Min bi lez û bez çû çeka xwe da milê xwe û vegeriyam.
Dema ez hatim hevalê Selman li ber siya zînarekî mezin rûniştibû û pal dabû. Ez çûm cem wî û em ber bi cihê hevalên stî ve meşiyan. Li ser şîverêkekî teng, ku carna keviyekî wî bi kendal û hendef re, min li pey wî dimeşiya. Hevalê Selman di sala 1992 yan de tevlî refên ARGKê bibû.

Ji Zagrosan bigirin heyanî Amanosan û Botanê li gelek cihê welat gêrîlatî kiribû. Gelek rojên bi zor û zehmetî derbas kiribû. Gelek hevalên kêleka wî şehîdketibûn. Bibû şahîdî gelek qehremantî û gelek leheng û egîdan nas kiribû. Gelek caran tîn birçî, gelek caran jî xizan û hêjarî dîtibû. Her wiha gelek caran xayîntî û nemerdî jî li wan hatibû kirin. Lê tu carî ji şop û fikra xwe derneketibû. Lewra jî westandin, bes dîtin an jî bêbawer bûn tu caran layîqê xwe û hevalên xwe jî nedîdit. Piştî demekî kin ku em meşiyan hevalê Selman bi dengekî nizim banî min kir;
-Hevalê Şevger ji te re tiştekî bibêjim.
-Bêje!
-Rêxistina me dixwaze li dijî tîmên kontra, tîmekî taybet ava bike.
-Birastî? Gelek baş e.
Li min meyze kir û axaftina xwe berdewam kir.
-Û hevalan min ji bona serbaziya vê tîmê guncaw dîtine. Min destpêkê tu tişt negot. Lê piştî du roj derbas bûn min biryara xwe da û min got ez dikarim bikim.
-Heval Selman çi pêwîst bû, piştî du rojan te biryar da. Ez bûma hema minê di cih de biryar dabana û minê bigota ez dikarim bikim.
Rûken li min meyze kir û got:
-Min te jî pêşniyar kir û hevalan jî pejirand. Piştre jî biryar hat dayîn ku tu bibî aligirê min. Nizanim tu vî yekê dipejirinî an na?
-Pêwîste du raj şûnde biryar bidim. Ma, heval Selman

mizginiyek ji vî xweştir tu dikarî ji min re bibêjî? Ma ez çawa napejirînim?
Hevalê Selman dest bi kenekî kir. Ez jî pê re keniyam.
Ez gelekî kêyfxweş bibûm. Bi taybetî jî, bi hevalê Selman re di nav rêxistinekî wisa de cih girtin tiştekî gelek cuda bû. Me zû de soza xwe dabû. Me gotibû, ger tîmekî bi vî awayî were avakirin, di herî rêza serî de yê divî tîmî de cihê xwe bigirin, ez û wî bûna. Ji xeynî me şeş hevalên din jî pêşniyar kiribû.
79

Ew jî hatibûn pejirandin. Ew heval jî hevalên bi moral û di şerê xwe de xurt bûn. Piştî em çûn gel hevalên stî û me peywira xwe bi cih anî, roja din bang li me heşt hevalan kirin û civîna tîma taybet hat çêkirin. Wate û girîngiya vê tîmê ji me re hat gotin. Yek jî wan hevalên di tîmê de cih digirt jê jî hevalê Şoreş bû. Hevalê Şoreş bi aslê xwe, ji Zaxo bû. Lê hêj dema ew zarok bû, malbata wan diçe Rojhilata Kurdistanê û zarokatî û xortaniya wî li wê derê derbas dibe. Piştî komploya 15ê Sibatê biryara xwe yê tevlîbûna refên gêrîla dabû. Hevalekî germ, bi coş û peroş bû. Ji hêla leşkerî ve jî gelek jêhatî bû. Kesekî ku demekî dirêj bi hevalê Şoreş re mabe, misogere pirsa:
-Heval Şoreş! Me tu caran nedît ku tu bêmoral bibî an jî nexweş bikevî.
Ji hevalê Şoreş dipirsî. Her tim ji bersiva hevalê Şoreş ji vê pirsê re amade bû. Digot:
-Mİrovekî şoreşger tu caran bêmoral nabe. Ji ber ku heta jê tê îdeolojîk û karker e. Ji ber vê jî, bêdisîplîn û bêmoralî li

derveyî prensîbên şoreşgertiyê ye.
Ev gotina hevalê Şoreş ne tenê di axaftin de dima. Heta dawî li gotina xwe xwedî derdiket û xwediyê xîret û cesaretekî mezin bû jî. Dîsa gelek girêdayê nirxan bû. Li ser girêdayîna nirxan û mirov wiha digot;
-Girêdayîna te çiqas ji şehîdan û ji Serokatî hebe jî, hewce nake tu vê yekê bigotin bînî ziman. Ya girîng ew e ku kesên te nas dikin ew vê yekê bînin ziman.
Germbûn, cesaret, girêdayîn û moralê van hevalan gelek bi rûmet bû. Nêzikê sê mehin ku me her heşt hevalan bi hev re derbas kiribûn. Gelek caran tîn û birçî, gelek caran jî bêxew man. Lê hertim bi bîr û bawerî bûn. Me bi hevûdu re kişfên xwe yên li ser dijmin çêkir û me bernama xwe û krokiya armanca xwe deranî. Kîjan yekîne wê êrîşê kîjan cihî bike tevde me diyar kiribûn.
Me heyameke din jî li dû xwe hiştibû. Heyameke din çûbû ava û heyemake nû dest pê kiribû. Heyama payîzê,
80

xuyanga xem û keseran hikim li ser xwezayê dikir. Daran pelên xwe ji xwe şexitandibûn û li her alî reşandibûn. Serê Çiyayên bilind bi mij û moran bibûn. Cihên bilind xwe bi berfê xemilandibûn. Me xwe berdabû nêzî deştê. Baran ji deştê kêm nedibû. Nûçeyên ku me ji herêmên din dibihîst carna dilê me xweş dikir û şadî dida me, carna jî jan û keser dixist dilê me.
Dîsa di wan rojan de nûçeyek li ser herêma Karox û Botî hatibû. Pêşmergeyan êrîşê ser hevalên me kiribû û hevalê

Merwan şehîd xistibûn. Çar hevalên me jî ji gelek cihên bedena xwe birîndar bûbûn. Ji ber ku yekîneyekî bi tevger bûn, nikaribûn hevalên birîndar li gel xwe bihiştina. Ji bona wan hevalên birîndar, ji gel me çar heval bipeywir kirin ku herin wana bigihijînin cihekî bi ewle. Beriya ku hevalên peywirdar derkevin ser rê, hevalê Selman ban min kir û got;
-Hevalê Şevger, bila heval hemû li cihekî kom bibin. Ez dixwazim hinek agahiyan bidim we.
Min tevahî hevala li bin siya darekî kom kir. Piştî hevalê Selman hat û li ser rewşa wan her çar hevalê birîndar agahiyan da me, di dawî de wiha got;
-Em hemû jî di amadekariyên şer de ne. Em hemû jî dixwazin bi germahî û moral tevlî şer bibin. Lê rewşa van hevalan gelek xirabe. Pêwîste ev heval werin rizgar kirin û ji herêma şer werin dûrxistin. Heke em wan hevalan bi saxitî rizgar bikin, ew kesên ku herî bişeref û birûmet wê em bin.
Piştî van axaftinan dema li hevalan mêze kir, dît ku heval hemû pê tesîr bûne. Ji ber vê yekê jî gelek kêfxweş bûbû. Her hevalek êdî ji xwe bawer bû ku wê bikaribe hevalan ji wî rewşa xirab rizgar bike û bikaribe peywirdarê vê peywirê.
Hevalê Selman vê rewşê fêmkiribû û ji nava hevalan bangî hevalê Şêrciwan û Şoreş kir.
-Bila ev heval bi min re bên, hevalên mayî jî, ku şer dest pê kir bila bi hevalên din re tevlî şer bibin.
Wan hersê hevalan amadekariyên xwe yê ser rê kirin.
Hin tiştên xwe yên zêde jî li gel hevalên mayî danîn, heyanî
81

vegerin. Tenê hinek derman û ji bona xwe jî têra du rojan xwarin li cem xwe birin. Hevalê Selman jî ji ber ku çentê min biçûk bû, hat ba min û çentê min ji min xwest û got;
-Bila çentê min li gel te be heyanî ez vegerim. Lê belê albûm û lênûsa min di çentê min de ye. Ev du salin ku min nedaye destê tu kesî. Hêvîdarim ku tu yê wan baş biparêzî.
-Heger te baweriya xwe bi min aniye tu dikarî hêvîdarbî ku heyanî tu vegerî ezê wan weke çavên xwe biparêzim.
-Lê heger em hev û din nebînin wê çawa bibe?
-Eger me hev û dû nedît, wê demê ezê bi hin hevalan re ji te re bişînim.
Hevalê Selman bi rûken li min nihêrî û got:
-Heger tiştek bi min hat, wê demê mirovên me li Mexmurê hene. Soz bide min ku tu yê teslîmê wan bikî.
Ez ji nişka ve di cihê xwe de ceniqîm. Tu caran tiştekî bi vî awayî nehatibû bîra min û ne jî min dixwest were bîra min. Min bersiveke hestiyarî da Selman, lê min nikaribû li rûyê wî mêze bikira.
-Na hevalê Selman, na! Ez axaftinên wisa navêm…
-Divê ku tu li bena wî bî jî. Di şer de her tişt dibe.
û berdewam kir;
-Tu yê soza pêkanîna tiştên ku min got bidî?
-Ji ber ku şer e û dibe ku her tişt bibe ez soz didim.
Rêheval Selman bi van gotinên min gelek kêfxweş bûbû. Lê heyanî min bersiva wî da, gelek zehmetî kişand. Di demên wisa de mirov gelek bihestiyarî nêzîkê hev û din dibe. Mirov wî hêzî di xwe de nabîne ku serê xwe rake û li rûyê hevalê xwe mêze bike. Piştî ku min soz dabû wî, hişk destê

min girt û me xatir ji hev xwest. Berê xwe da min û wiha got;
-Baweriya min wê her tim ji te hebe. Hûn jî baş li xwe binêrin…
Piştî ew çûn bi çend rojan şer dest pê kiribû. Di pêngava yekemîn de, narincoka hevalê Berxwedan di destê wî teqiya bû û şehîd ketibû. Yên ku karibin li ser bingehekî rast wate
82

bidin şehadeta hevalên xwe, ew kes her tim ji wan hevalan wê hêz bigire. Her çiqas perçeyekî dilê me jî bi xwe re dibirin, hêza serkeftinê ew bi xwe bûn…
Erdnîgarî bi tevahî di wênera me de bû. Piştî çend rojan min bi laserkê bi wan re axifî. Di demekî kin de wê bigîhiştana me. Roja ku hatin ez li Qendîlê li gira herî bilind bûm û min muhabere dikir. Du hevalan nûçeya hatina hevalê Selman û wan hevalên din ji min re anî bûn. Wê şevê emê bi hev û din re biçûyana çalakiyê. Dema ez gihiştim cem wan li ser çokan rûniştibûn û plansaziya çalakiyê dikirin. Ez bi dizî çûm pişt hevalê Selman û min destê xwe danî ser çavên wî, lê di cih de wî ez nas kirim. Bi dîtina hev em gelek kêfxweş bûbûn. Li min mêze kir û got;
-Baş bû ku tu hatî. Ji bona ku em bi hevûdû re biçin çalakiyê min agahî daye hevala.
Piştî me rewş û hewalê hev û din pirs kir, ji bona amadekariya çalakiyê ez ji gel wan çûm cem hevalê Şoreş. Emê bîstûçar heval bi hev û din re biçûyana çalakiyê. Hevalê Şoreş cihê xwe di nava her şeş hevalên ku di koma êrîşê de

bûn, cihê xwe digirt. Serdarê koma êrîşê hevalê Birûsk û Rêdar bûn. Hevalê Serdar jî, di nava koma taqwiyê de cih digirt û ew jî ji şeş kesan pêk dihatin. Ev herdu kom wê bi hev re biçûna cihê çalakiyê. Min jî cihê xwe di nava duwanzdeh hevalên mayî ku di koma parastinê de bûn digirt. Me yê saet heştûnîvê êvarê biketana rê. Kêf û morala hevalan di cih de bûn. Piştî em ketine rê û demeke kin meşiyan hevalê Selman ji rêza xwe derket, hat gel min û wiha got;
-Divê tu wê sengera ku li hember te ye bi lez bêtesîr bikî.
Ji ber ku çeka min BKC bû, pêwîst bû ku min wê sengerê bêtesîr bikira.
Em nêzîkê sirtê çiyê bûn. Dinya tarî bibû. Heval bi hişyarî dimeşiyan. Diviya ku em ji hev qut nebûna. Koma ê-rîş û teqwiyê jî wê berwar biçûya ser hedefa xwe û em jî sirt sirt biçûyana. Tu asteng li pêşiya me derneket û bi vî awayî
83

me cihê xwe di sengeran de girt. Me dixwest ku bi hevalên din re bi laserkê biaxifin. Lê belê bersiva laserkê nedihat dayîn. Em hemû di nava şayîşekî mezin de bûn, ka çima heval bersiva laserkê nedidan? Gelo laserka wan xirabibû? Gelo nobedarê dijmin wan dîl girtine an jî…Na, ger wan bidîtina wê dengê teqîna çekan bihata û wê şer dest pê bikira. Çi qewimî bû kes nizanibû.
Nêzîkê çarîkek bi vî awayî derbas bû. Ji nişkêve ji cihê ku ew lê diman dengê teqîna çekan hat. Rêheval Birûsk nobedar kuştibû û bêtesîr kiribû. Nobedarê duyemîn jî li

heval Rêdar xistibû û heval Rêdar şehît ketibû. Li wê derê tevlîheviyek derketibû. Çar heval jî birîndar bibûn. Rêheval Selman ji bo ku wana xilas bike diçe, lê pêşmerge narîncokên destê xwe davêjin ser wan û nahêlin. Narîncokekî bêbext di navbera hevalê Selman û Şoreş de diteqe û herdu heval jî tevlî karwanê şehîdan dibin. Di wê qeyrana pevçûnê de her hevalekî ban li hevalên din kiriye ku bizanibin kî sax maye kî birîndar û kî tevlî stêrkên asîmanan bûne. Çar heval tenê xwe xilas dikin û hevalên birîndar bi xwe re tînin. Destpêkê pêşmerge sengera xwe berdidin û diçin. Lê piştre dîsa vedigerin û nahêlin ku hevalên şehît ketine ji aliyê hevalên din ve werin veşartin. Em hemû di bin gulebaranê de mabûn. Tu axaftin di laserkan de çênedibû.
Em di parastina hevalan de bûn. Hevalan ji me re gotibûn, paş ve vegerin. Lê tu kes ji me nizanibû ku heval şehît ketine an jî birîndar henin-tunenin. Em hemû di nav bêhedaniyekî bêpênase de bûn. Nema axaftin ji me çêdibû. Êdî me îdare nekir û çûn cihê ku me biryar da bû û li benda hevalan sekinîn. Hevalekî xort hevalekê bayan bi birîndarî bi xwe re anî bû. Hevalê Zinar ji me re got ku çar heval şehî-din û çar jî birîndar in. Divê ku em bi lez biçin wan ji wê de-rê bînin. Min jî ji bona parastina xwe peywirdar kirin. Lê hîna jî di derheqê hevalê Selman û Şoreş de tu agahî negihiştibû me. Ez çûm cem hevalê Zinar û rewşa wan hevalan pirsî. Hevalê Zinar sekinî û li min nihêrt. Di çavên
84

wî de xemgîniyek xuya dikir. Nedixwest bersiva min bide û

çavên xwe ji min direvand. Kêliyekî meşiya û ji min dûr ket. Di nava min de dudiliyekî hebû. Di aliyekî de min dixwest ku bersiv bigirim, di aliyekî de jî tirsekî di nava min de hebû ku nedihişt ez bi rastî jî bersiv bigirim. Hestên gelek cuda di nava min de hebû û ger bi germahiyekî dikelijiya, carna jî wekî cemed girtibe sar û matmayî dima. Dîsa jî li hember hemû tevlîheviyên hestên xwe ji nişkê ve li pey heval Zinar ketim, milê wî girt û jê pirsîm;

-Hevalê Selman li ku derê ye? Te bersiva min neda!

Di wê keliyê de ji çavên wî yê sor û şilî de rondik bariyan û bi kelagirî;

-Heval Selman, Birûsk, Şoreş û Rêdar tevde tevlî karwanê şehîdan bûn, bûn stêrk û çûn asîmanan. Cenazeyê wan jî tu derfet tunebû ku em veşêrin. Dijmin hedan neda me ku em wan li wir nehêlin.

Di wê kêliyê de hemû rojên min jiyan kirî li ber çavên min derbas bûn, ew hevaltiya ku min bi wan hevalan re jiyan kiribû hemû di nava min de şopekî ji agir dihişt û derbas dibû. Dîmenên curbecur yên wan hevalan; kêliyên me yê bi kêf, hêrs, kîn û bi heyecan di carekî de di awêneya jiyana min de xuya bûn. Tu gotin û peyv nikaribûn wê kêliyê pênase bikirana. Min bawernedikir ku ew niha jiyan nakin. Ji min re ew wekî nemiran bûn. Guhên min dengê guleyan nedibihîst.

Lewra rastî carna gelek tal be jî, rastiye. Ew şehît ketibûn. Êdî hebûna wan di dilê me de wê bijiya. Germahiya wan wê her tim di rih û giyana me de bihata hîs kirin. Min tu car wan hevalan ji bîr nekir û ne mimkune ku mirov ji bîr

bikim jî. Ew giyana rihê me, hêza jiyana me nin. Tu car axaftinên Heval Selman ku di hemû jiyana min de ji min re bûye wekî fermanekî, ji bîr û ramana min derneket. Wekî doh ew dengê wî yê ku soz ji min girtibû di gohên min de ye. Lê wî nizanibû ku wêneyên wî dabûn min, min di dilê xwe de neqişandiye. Gelek hevalan wan wêneyên hevalê Selman
85

ji min dixwestin, lê belê fermana wî her tim di bîra min de bû û min wan wêneyan diparast ku derfetekî malbata hevalê Selman bibînim û wê fermanê bi cih bînim digeriyam. Her tim vê fermanê pêkanîn, ji bo min dibû giraniyekî mezin. Daxwaziya min ya yekem pêk anîna wê fermanê bû. Bi sebrekî mezin û bi hêviyekî xurt li benda derfet û şensekî bûm.
Carekî, di 27ê Mijdarê de, di salvegera damezrandina partiyê de, em hemû di nav tevgereke bi heyecan û coş de bûn. Amadekariyên pîrozkirina vê rojê di her cihê de pêk dihat. Ji bo vê roja birûmet moral hatibû amadekirin. Ji Mexmûrê gelek mêvanên me hatibûn. Mirovekî ku temenê xwe mezin hate gel min, silav da û rûnişt. Di wê kêliyê de min germahiyekî li hember vê mirovê hîs kir. Lê belê, ji min re wisa hat ku ev germahî, wekî germahiyekî heskirina gerîla ji gelê xwe û mirovan dihat. Bi rastî jî gel ji bo gerîla xwedî wateyek cuda bû. Hemû zor û zehmetî, êş û janên ku dikişandin çavkaniya xwe ji gel digirt. Ew ji bo me çavkaniya jiyanê ne. Erê, ev mirovê ku hatibû gel min, nedihat bîra min ku xizmê hevalê Selman be.

Dema ku wî ji min re got;
-Min ji gelek hevalan wêneyê Şehîd Selman xwest, lê be-
lê hemû hevalan ji min re got ku tu tim li gel wî mayî.
Destê min girt û rondik ji çavan bariyan;
-Wêneyekî wî hebe, ji te lava dikim tu bidî min.
Min fêmkir ku ev misogere ku xizmê hevalê Selman e.
Nema tu gotin ji lêv û devên min derdiket. Ketibûm bin
bandora bîranînên xwe yê bi heval Selman re. Dîsa dilê min
tije xem û keser bibûn. Hesreta wan hevalan dîsa dil min
kizirand. Ji çavên min rondik bêgumana min barî. Erê, kêliya
fermana hevalê Selman bi cih bînim hatibû. Di aliyêkî de he-
yecana pêkanîna wî peywira girîng, di aliyekî de jî hesret û
heskirina wan hevalan re guvaştina dilê min, min kelegirî
kiribû.
86

Min bi peyvên kelegerî ku ji qirika min qut qutî
derdiketin, bersiva wî da;
-Erê, rast e. Wêneyên hevalê Selman bi min re hene û hin
tiştên din jî hene ku ez bidim malbata wî.
Min albûm û lênûsa hevalê Selman derxist;
-Beriya hevalê Selman şehîd bikeve van dabû min ku ez
bigihijînim malbata wî. Ev ji bo min gelek girîng bû. Soza
min û baweriya hevalê Selman ku ezê vê sozê bîmin cih, ji
bo min fermaneke gelek girîng bû. Niha vê fermanê bi cih
anîn ji bo min kêliyekî dîrokî ye.
Piştre min emanetên hevalê Selman dirêj kir.
Soza min ya duyemîn, fermana min ya jiyanê yê

duyemîn ma bû. Ew jî her tim bi rih û şopa wan hevalan re jiyan kirin….
Vegotin: Şevger Sîpan
87

HÊVİYA Dİ XAKA MİRÎ DE
“Derûdor bi giştî deşt bû, heya ku şiyana dîtina çavên te hebin, wê tu erdê rast û bêgiya bibîne. Ji dûr ve şepolên germê weke avê xuya dikir, rewrewk dibin hêmana welatekî biyanî yê ji rastiya me dûr û nenas e.”
Ev bû demeke kurt e ku di xew ve çû ye, lewra bi dudilî ji xewê xwe dikşand. Lê bêhîle bû; ji sedema germê û kelmêşan çavên wî xew nedidîtin. Lê dîsa jî pêwîste ji hûnikiya sibehê sûd wergire. Dema herî xweş ya li vê wargehê, dema sibehê ye, jiyan bi awayekî teze û rep dest pê dike, lê dûv çend katjimêran, her tişt tê guhertin, êdî roja havînê a germ û zer, desthilatiya xwe ya estem li ser cihanê rêdixe. Her tişt zer dibe, xaka zer û şewitî, ezmanê zer û kevirên zer, bayê germ yê weke ku ji dozxê hiltê bi xwe re jî ax û gemarê li ser rûyê mirovan dixe û xwe berdide hinav û melakan.
Wek her carî, ku karekî girîng hebe, ew zû ji xew radibin, bêyî ku xwe dereng bixin, her tiştî xwe amade dikin û berê xwe didin cihê kar û bûyeran. Xebata wan wê îro gelek zor be; îro roja hilbijartina ne, her kes dilibitî, lê belê ên herî zêde ku bê rawestandin digerin, ekîba wan ya MEDYA bû.
Piştî 25 salan ji karê li ser pişta keştan, di sepeta

deryayên cihanê de keştevanî kirin, hemû welatên cihanê dî-
tin, lê weke lawê deryayan hatibû, bi şepolên har re şîr
veqetandibû. Lê di dawiyê de bîryar da ku xalekê li ser
88

çîrokên keştîvaniyê dayne û li ser cihana bilind bibe şervan û
rojnemevan. Piştî birîndarî û xebata çend salan di hembêza
çiyayên bilind de, xatirê xwe ji wan lat û çeman xwest. Niha
jî bûye rêheval û yek ji endamên HPtv yê pîr.
Jiyana bajarê Stenbolê gelek rihet û bê xem bû, lê jiyana
wê, piştî ku di encama qezayekê de bû nîv însan, êdî di
valatiyekê de diçû û dihat. Gelek biçûk bû, lê tovên lêgerîna
arzuyên azadiyê û watedariya jiyaneke rast, di raman û
giyanê wê de hatibû çandin. Êdî jiyana rihet û delal, hêviyên
wê têrnadikirin, lewra oxiriya xwe ji bajarê mezin xwest û
berbi jiyaneke biwate ve gavên destpêkê avîtin. Dema nû hat
vê xebatê, şerm dikir ku bi vî karî rabe, lê niha...
Ew ji vê derê û vî karî re ne amadebû, hêviyên wî
cudabûn, tola destana jiyanê her tim di hindirê wî de weke
agirê volqanê dikeliya. Qîrîniya wan dihat, arîkarî dixwastin,
teqemeniya wan nemabû, lê rê dûr e û tiştek bi destê wî
nedihat; tenê bêjeya “Tol” di mejiyê wî de lêdida. Lê her tişt
di nîvî de ma, wî jî ji wan xakan koç kir û xwe li vê derê dît.
Niha jî, keştîvan, keça biçûk û lêgerê Tolê bûne endamê yek
saziyê, armanca wan yek bû û hêviya wan jî pir mezin bû.
Ji dûh de amadekariyên bi rêkûpêk dikirin, wê niha jî di
qada kiryarî de xebata xwe pêk bînin. Pêwîste îro
bernameyekê li ser hilbijartinan çêbikin. Derfetên wan gelek

bisînor û kêm bûn; lê di vir de tu çendî karê xwe hez bikî, wê serkeftinên birûmet û mezin bi dest bixînê.
Mirovên me dema ku tên hember amêra wênegirtinê (kamera) dikevin rewşeke cuda, êdî ji xiroşyê nikarin bipeyîvin, devê wan li ber hev dikeve, û xweydan di bin lingên wan ve davêje, lê dîsa jî ekîba MDE ya wê bernama xwe çêbikine. Ew tax bi tax, kolan bi kolan digeriyan.
Roj gelek germ bû, cîhan disincirî, destê min ji xweydanê nikaribûn kamera bigirta, serê me ji germa ve gêj dibû, lê tu mafê me yê gilî û gazinc kirinê tunebû; ji xwe ma emê gazincên kê, ji kê re bikine?
89

Her der qerbalix bû, lê dema ku xebatkar û karmendên berpirsiyarên hilbijartinan, em didîtin, weke her carê, yekser qîrdikirin:
-Bi lez, rê ji bo hevalên çapemeniyê vekin.
Di van rewşan de, rola amêra wêneyan gelek girîng e, tew tu derî li pêşaya wê girtî namînin, her kes xwe nêzikî te dikin.
Hilbijartin hîn berdewam dikirin, her kesî ji xwe dipirsî "gelo wê kîjan berendama, biserbikeve?", lê ev yeka ji bo me tu girîngiya xwe tunebû. Piştî bêhdana nîvro hevalê Hawar (yê keştîvan) ji me qetiya, bo ku hinek agahiyên razî yên girîng bi dest xwe bixe. Lê berî ku biçe wiha got:
-Hûn li vê derê bimînin, da ku ez vegerim, hûn dikarin bêhna xwe vebikin.
Hevalê Hawar, dizanibû ku em gelek westiyane, lewra

xwest bi tenê wî karî pêk bîne.
-Başe heval Hawar! Em li hêviya te ne.
Me dixwast ku ji bin rehma vê roja germ birevin, êdî şiyana me li ber vê germahiyê nemabû, ji ber ku bêmariyên me yên giran hebûn, lewra pêwîst bû em xwe biparêzin, lê belê çawa û li kû derê?
Hevala Amîle (lêgera watedariyê) ji min re got:
-Ka em biçin seyrangeha zarokan.
Bi matmayî min got:
-Seyrangeh!! Çendî ev bû nêzikî 10 meha ne ku em bi hev re li wargehê xebata Medya yê dikin, lê dîsa jî ez bi qasî hevala Amîle, hemû cihên wargehê nasnakim.
-Ew seyrangeha zarokan li kû derê ye?
-Ma tu nas nakî?!... Ne gelek dûr e, emê li wê derê li benda heval Hewar bisekinin.
Bi ber ve wî cihî de bi rêketin. Lê, çi seyrangeh, çi meyrangeh! Û çihal? Cihê lîstikên zarokan, bacan û îsot çandine! Ji xwe zarok bi çi awayî nikarin nêzî seyrangeha (yanî baxçe) xwe bibin, qîr û qîja baxçevan li benda wan e. Dema ku xebatkarê seyrangehê, çenteyên reş yê baldar li ser
90

pişta me dît, yekser em naskirin û bi rûyekî şad, bixêrhatina me kir. Bi rastî jî ev seyrangehê li gorî cihên dîtir, weke biheştê bû. Bayê hunik li ser me de hilat, bihna me fereh kir, vê rewşê dîsan jiyana çiyê anî bîra me, ku em bêdaxwaza û vîna xwe jê dûr ketine. Çendî ku em ji bo vegera çiyan pêşniyaran dikin jî, lê belê heta niha, ji ber gelek sedeman, tu

pêşniyaz nehatine pejrandin. Tenê ji me re bîranînên wê jiyana rengala ma ne. Em ji xwe re car- car bi hesret qala jiyana û hevalên xwe ên di çiyê de dikin.
-Êdî van dîmenên zer û ziwa çavên min bêzar dikin. Min bîra dîmenên rengîn kirê ye.”
-Welah! Tu çi jî bikî, te ew dîmena ne, careke din nedîtin!
Di nav bexçe de, hewzekî avê hebû. Ev bû demeke dirêje ku me aveke mezin nedîtî ye, lewra em bi dilşadî nêzî hewzê avê bûn. Hewiz 2 mitran bilind bû, bi pêldemûkan mirov diçe ser qeraxên wê.
Derdor bi giştî deşt bû, heya ku şiyana dîtina çavên te hebin, wê tu erdê rast û bêgiya bibînê. Ji dûr ve şepolên ger-mê weke avê xuya dikir, rewrewk dibin hêmana welatekî biyanî yê ji rastiya me dûr û nenas e. Êdî ji vir û pê ve xaknîgara bilind bidawîbûna zincîra qereçoxê diqede, ev yeka jî, li ser derûniya mirovan bandorên biyanî û aşqurt diafirand. Di vê cîhana sincirî de û di nava van dîmenên ziwa û req de, ancax mirov rê li pêş herkandina bêbend ya kaniyên bîranînan vekê. Çendî ku rûpelên xembar û melul tê de hebin jî, lê dîsa ji vê dozexa yê baştir e.
Bi destên xwe, av dipeland, çilpe-çilpa ava pêldar, çem û rûbarên çiyan anîn bîra min.
-Çend xweş e ku mirov niha li kenarên Avaşîn be!
Bê yî ku hevala Amîle li min binêre, bersîva min da:
-Ava Lolanê ji hemû avan xweştir e, bi taybet jî van deman.
-Ya?

Dema ku qala Lolanê kir, bi hesret, ew gotina ji dev derket, diyar bû ku hevala Amîle gelek ji wan cihan hezdike û bîrê dike.
-Li vê derê agir bi erdê dikeve, niha li ser girên bilind jî berf heye.
-Ez ji berfê hez nakim!
Matmayî mam, min dixwest sedema nehezkirina hevala Amîle ji berfê re bizanibim. Lê, bi dûdiliyekê ketim... Lewra min gotinên xwe bêxwestek daqoltandin, û xwe bi lîstina bi avê mijul kir. Piştî çend kêlan ji bêdengiyê, hevala Amîle serê xwe kêmekî rakir û li asoyên zer mêze kir. Min dît ku du rundik ji çavên wê diherikin xwarê. Min ferq kir ku pêwîste mijara me bê gûhartin:
-Te bernama xwe ya li ser zarokan hîn neqedandî ye? Te çawa kir?”
Lê weke ku tew dengê min neçûyê, ne bersîv da, ne jî çavên xwe ji lênêrîna asoyan qerand, vê yekê jî, hîşt ku dîsa ez xwe berdim hundirê arîşê xwe. Hevala Amîle di deryayên xeyalên xwe de keştîvanî dikir, laşê wê li ser kenarê hewzê bû, lê ew bi hest û hizrên xwe li cihekî dûr- dûr bû. Rondikên germ ji çavên wê dihatin xwarê, vê rewşa xembar ez jî, xemgîn û bêzar kirim.
-Heval Amîle! Ka em biçin avahiya şehrevaniyê. Ka em mêze bikin ku çima heval Hawar heya niha nevegeriya gel me?
Hevala Amîle li demjimêra xwe mêze kir û got:

-Lezneke, hîn wext nehatê ye!
-Kêfa min ji vê derê re nehat, şêniyê gundan tîne bîra min.
-Bibûrîne Heval Can! Gotina berfê bi xwe re hevalê Nesîmî anî bîra min. Ji bo wê ez kêmekî mijul bûm....
-Tu behsa ew hevalê ku carekê di kovarê de te li ser nivîsandi bû dikî ye ?
Bi kesereke bijan re got:
-Rast e, rast!
92

-Ma çi peywendiya berfê bi bîranîna heval Nesîmî re heye?
Hevala Amîle, bê ku destê xwe ji avê derbixîne, û bêyî ku çavên xwe ji aso yê bêheyam biqerîne, dest bi vegotina bûyerê kir:
-Min ji hevalê Nesîmî gelek hezdikir, ez di nav refên gerîla de nû bûm, ew jî mamosteyê min bû. Nesîmî hevalekî zana û rewşenbîr bû, her tim bi min re diket dan û standinê, alîkariyên mezin bi min re dikir. Zivistana sala 2000an yekîneyên me nêzikî hev bûn. Her ku derfet bi destê min diket, ez diçûm serlêdana hevalê Nesîmî û wî jî di vê yekê de qusur nedikir.
Hevala Amîle, bi kenekî melul, behsî hevalê Nesîmî dikir:
Min jê re digot;
-Heval Nesîmî! Rojekê wê emê herdû jî bibin dû serleşkerên mezin, di hembêza Çiyayên Munzur ê de emê wargehên xwe çêbikin. Jixwe tu ji bo karên serbazî nabî, lê

belê ez serbazeke mezin û zîrekim; wê yekîneya min şer û çalakiyan bike û yekîniya te jî karên bîrdozî û rewşenbîrtî bikê ye!”
Her tim di navbera gotinên xwe de, henaseke bikeser berdida, ev jî dibû hêman ku ev bîranina gelek bi êş û keder e. Ez bêdeng mabûm, weke şagirtekî ku li hokarê xwe guhdar dike li min hatibû.
-Wê salê berf gelek bariya bû, sir û seqem desthilatdariya xwe li ser cîhana çiyayên bilind ferişandibû. Di wan rewşan, rojek bibaran û ba yê sar de, carekê ez çûm serlêdana heval Nesîmî. Ji serma re ez dilerziyam, serê min şil bû, dema ku hevalê Nesîmî ev rewşa min ya şepreze dît, bi min keniya.
-Çima tu dikenî? Tu qerfê xwe bi min dikî? A?
Hevalê Nesîmî wiha bersîv da:
“Ma çi ji te re? Ez bi kenê xwe azadim! Ha”
93

Piştî ku me xebata xwe qedand, di wê sermayê de em vegeriyan yekîneyên xwe. Piştî ku em sed mitrî ji yekîneyên wan dûr ketin, ji pişt ve dengek hat :
“ Heval Amîle! Ka raweste...Amîle...”
Dema min li paş xwe mêze kir, hevalê Nesîmî li pêy me dihat û gazî me dikir.
-Çi bû heval Nesîmî? û ez hêdî-hêdî ber vê de çûm.
“ Vî kûmî bide serê xwe, ji bo tu nexweş nekevî, û bo ku Nesîmî bi te nekenê! Roja înê ezê bêm gel we.”
-Spas... Ez li hêviya teme... Ji bîr neke, temam.

Hevala Amîle desmala xwe derxist û rondikên xwe paqij kirin û gotinên xwe berdewam kirin.
Bêhedar û li benda roja înê bûm, wan rojan berf bêbêhdan dibariya, hemû rê hatibûn girtin, cih- cih aşutên berfê diketin. Lê min dizanibû ku heval Nesîmî wê werê serdana me. Rojgar giran dibûriya û heval Nesîmî diyar nedikir. Ez ji nehatina wî gelek bêzar û bixem bûm, roja înê ber bi dawê ve dixûşiya, tarî kete cîhanê û heval Nesîmî nehat. Lewra min bîryar da ku ez sibê biçim serdana yekîneya rewşenbîran. Lê min nezanibû ku feleka bêbext çi ji min re di buxçûka xwe de veşartê ye.
Berfa pilîd li qurbanekê digeriya, hemû şêwaz û rêkên curbecur dixiste rolê, bo ku candêran di hembêza xwe ya sar de bêhenase bike, her sal ew bê destur dikeve welatê me, jiyanê diqerisîne, cihana lewaz û aşqurt dixe bin desthilata xwe ya estem û bêrehm. Geh bi narincokên spî, geh jî bi şewtandina laşê candêran û geh jî bi renî û xezebên aşutên ejderhayî êrîşên xwe bêrawestandin dibir ser mirovên ku xwe spartine hembêza çiyayên xwe. Lê ev berfa dûrî jiyanê azîne û estem dike. Lê gelo! Vê carê kî hatiye hilbijartin, bo ku bibe qurbana xwezaya pîr? Kî ye?
Lê sibehê, serleşkera min destur neda min, ez ji vê helwestê gelek tengezar bûm, min sedema vê yekê jî fêm nekir. Di rêvebiriyê de, hevalan bi zimanê Almanî bi hev re li ser tiştekî diaxifiyan, weke ku li ser tiştekî bi min re
94

têkildar e dipeyîvan, ji min re wiha dihat. Min hîsdikir ku

tiştekî ji min vedişêrin, lê çi ye , ne diyar e. Min hemû hîs û hişyariyên xwe da ser gotin û bizavên lêv û rûyê wan. Belkî tiştekî ji wan fêm bikim. Di nava gotinên wan yên bi Almanî de, gotineke Kurdî ji devê hevalekê şemitî, yekser weke biruskê li mejî û canê min xist, devê min berhev ket, min dixwast qîr bikim, bigrîm, lê zimanê min hatibû girêdan, laşê min dilerizya, carekê bi hemû hemdê xwe min qîr kir...!
Heval matmayî man û pirsiyan:
-Çi bû?...Hevala Amîle... Çima tu qîr dikê? Aram be heval...Xêr e te?
Min nedizanibû çi bêjim! Ji ber ku tiştekî berçav û zelal ji bo gumanên min tunebûn, her wiha jî giriyê di qirika min de rê li pêşiya axaftinê digirt.
Hevalan ez birim odaxê, li wê derê hevalek bi dilpakiya xwe hate gel min , ji bo li ber dilê min de, min bêdeng bike, û kerba min kêm bike.
Wê havalê nizanibû ku, tenê gumanên min hene, ji bilî wê gotinê tiştekî zelal ez li ser tu bûyerê nizanim.
-Hevala Amîle! Em hemû li ser vê rê ne, yanî tu kes ji vê zagona herdem rizgar nabê... Bîraninên wan wê her tim bi şanazî di bîr û ramanên me de bijîn.
Min nizanibû ku çima va hevala li ser van tiştan bi min re vedibêje. Lê firmêsk ji çavên min dibariyan. Şiyana axaftinê bi min re nemabû, bêjeyên min ketibûn bîreke kûr û dûr...
-Ne tu tenê ji hevalê Nesîmî hez dikî. Em hemû ji rêhevalên xwe yê şoreşê hezdikin. Xweza rehmê li tu kesî nake. Hevalê Nesîmî jî dûh bû qurbana aşutên berfê.

Di mejiyê min de wekî ku birusk lêdidan, min nikaribû vê agahiyê rabikim. Yekser ji ser hişên xwe çûm.
Wexta hevala Amîle, gîşte vê xalê, ku bi awayekî xembar, ev bûyera vedigot., min êdî şiyan nekir ku firmêskên çavên xwe bisekinim. Dilê min bû pizoteke ji agir, di laşê min de weke pêlên ceyranê lêdidan. Asoyên ziwa jî bi
95

me re ketin xemgîniyê. Cihana sincirî ketibû bêdengîyeke goristanî, bayê germ, dengekî weke awazên biloreke xemgîn bi ser giyanê me de dihat. Êdî derûniya min ev atmosfera xembar nikaribû jiyan bike. Min hevalê Nesîmî pir li nêzî xwe dît, çendî ku min tenê wêneya wî dîtibû, lê dîsa jî min gelek jê hezkir. Lê ax û hezar ax ku giyanê Nesîmî bi azadî li ser lotkên Çiyayê me hêlan dike.
Min dixwast ku êdî hevala Amîle li ser vê bûyerê ne axifê; lê weke ku ew jî ji zûde ve li kesekî weke min digeriya, ji bo dilê xwe bi axaftinê rehet bike, lewra wê vegotina xwe berdewam kir:
-Min nikaribû bawerbikira ku berfa bêbext û pilîd, giyanê hevalê min jê girtêye. Na! Na ez bawer nakim ...
Hevalê Nesîmî soz da min ku wê werê seredana min, komê wî li gel mine, ku ji bo kom mabê jî wê werê ye vir; ew tu car soza xwe li erdê nade, misogerim ku wê werê! Wî evqas sal di zindanan de li ber xwe da, bîryara xwe neşkênand, ez wî baş nas dikim, bi asanî nabe qurbana berfê..Na!
Çend rojan li ser hev ez digiriyam, bi tu kesî re nediaxifiyam, ji tevahî jiyanê qut bibûm. Çima!? Çima ev

feleka bêbext, her tim kesên ku em ji wan hez dikin jiyana wan kurt dike? Çima?
Ew li vir e, rast e li vir e! Li ser girekî bilind, gora heval Nesîmî çêkiribûn, ew bi aramî di hembêza dayîka xwe de xew dikir, li dora gora wî berf heliyabû, gîha nû şîn bibû. Ah...Hevalê min êdî dema koçbertiyê bidawî bû, geryana wî li vê derê xala kutahiyê danî bû, êdî canê ciwan ji lîstikgehên zarokatiyê xwe, ji pirtûk û pênûsên xwe, ji kenê xwe yê rind qutbûye. Li sere wî girî hewa pir sar bû, lê laşê min weke agir bibû, "ax heval Nesîmî! Çima tu çû yî?... Gelek zû bû, te gelek lezgîn ji dêwana çîrokên me yê vê jiyanê derketî, te hemû helbestên me di nîvî de hîştî, lê tu bûyî gula û serenûsa destan û helbestên rêhevalên xwe. Tu gelek êş û a-zar di kûrahiya dilê me de afirand... Çima hevalê me, çima?" 96

Min heya niha nizanibû ku dilê hevala min ê biçûk evqas kûl, azar û xemgînî radike. Ev keça ciwan di kûrahiya giyanê xwe de bîrîndar e, bi êş e û jan e.
-Tu dizanî hevala Amîle? Ku tu caran jiyan ranaweste, her tim diherike, bi yeksanî hemû kesî di dawêde dixe nava lîstikên xwe yên curbecur. Niha em jî, di rêza xwe de sekinîne. Jiyan ev e. Lê tiştê herî binirx û şanaz ew e ku mirov di vî jiyana kurt de, bi vîn û pîvanên bilind bijî, mirov bûrûpoş (maske) bijî, tu car ji nerastiyan re nebêje erê û her tim ew kesên ku cihekî wan ê mezin di jiyana me de heyî, bibîrbînin, arezû û awatên wan bicih bînin. Bawerim ku niha hevalê Nesîmî di gora xwe de aram û dilniya ye!!

Berî ku hevalê Hewar werê, me çavên xwe ji şilahiya firmêskan pak kirin, lê firmêskên dilê me weke lehiyan dikeliya. Piştî ku heval Hewar hat, em dîsa vegeriyan xebata xwe ya ji bo bernameya telvizyonê li ser hilbijartinan. Ew roja bi awayekî lezgîn dibûriya, bername jî, ber bi dawî ve diçû.
-Hûn amadene?
-Belê, kamera amade ye.
-Hevala Amîle! Tu amade yî?”
-Belê, amade me.
-Niha dest pê bikin.
Tiliya xwe da ser dugma vekirinê, dîmenê komên dengdanvana (ku ji bo têkevin kamera yê her bizav û libat di-kirin; yekî ji wan pisîkekî biçûk xistibû destê xwe, bo ku bala me bikşîne ser xwe!) bi şêwazê Total girtin, hêdî hêdî berê kamera bir ser hevala Amîle;
-Tameşevanên hêja, niha li wargeha me, ji bo hilbijartina serok û endamên danişgeha saziya şarevaniyê, hilbijartinê demokratîk di nava gel de bi kêfxweşî û dilşadiyêke mezin de bi rêve diçe. Niha jî emê....”
Êvarê karê me bi dawî bû, em vegeriyan saziya çapemeniyê, hêz di me de nemabû, gelek mandî bibûn. Di
97

avahiya saziyê de, hevalê Mahîr Mîmarci li benda min sekinî bû,
-Heval CAN! Mizginiyeke min ji bo te heye, wê gelek li ber dilê te şa be.”

Min yekser ramana xwe xist tevgerê ji bo ku ez vê mizgînê têderxim, lê hewldanên min bêakam bûn.
-Ka mizgînî ji min re bibêje... Bi lez, de ka bêje.
-Pêşniyara te hat pejirandin, xwe amade bike, ji bo çûyîna çiya yan..
- H ê ê! Bijî, bijî, vaya demhat ku ez vegerm bihuşta xwe ya pîroz...
Heval Amîle, heval Hewar û hemû hevalên dîtir, ji qutbûna me ji hev gelek xemgîn bûn lê banga çiyan bi hilmên bayê bakûr, ji min re nameyên şîn tîne. Êdî bi xatirê te ey cîhana zer û sincirî, bixatirê xaka zer û bayê germ, bi xatirê zarokên pêxwas û çavkujul, bi xatirê xewnên dîtina çiyayan.
Merheba xaka pîroz, merheba, gelo çi li benda min e?
Nediyar e!
Kî dizanê ku li bilindahiya Çiyayê Zaxrosê, Girê Mîros, komê dijminan di çemberê de, li benda me ne, bi niyaza rêbiriya me bikin û hêviyên me bi fişekên xwe ên neyar vala derxin; lê me waz li hêviyên xwe nehanîn û dîsa jî me dest bi risandina çîrokek nû kir û.....
Polat Can
98

SERÛWENA KU NÎVÎ DE MA
“Katjimêr bibû yazdeh. Stêrk li asîmanan diçirûsiyan. Hê hêyv derneketibû. Bêhedaniya koma gerîla zêdetir dibû.”
Baranên bê navber yên meha adarê a sala 94, şîniya asîman heta şîniya avaşîn tevahî şîniyan dîl girtibû bi dilopên

xwe…
Avaşîn diherike, ji ber şapebaranê bor û har bûye, di rengê heriyê de, bi awayekî şêt û dîn diherike. Di stêra qirê-bûyî de bi parastineke rikoker a şîniya xwe, dibe şînroniya çîroka Çiyayê qaf û diherike. Hem li nav hem jî, li devreyî heyam û dîrokê, bi derbûyîneke hêmin û sekan gava ku digihîje basya, bi parvekirina şîniya xwe ve diherike. Li navîna deştê ev herdu çem, xeteke şîn a yekbûyî ye. Par dibe, rast dibe, şînahiya xwe ji mirov, lawir, giya û kulîlkên deştê ve vedibêje, nîşan dide û lêdixe, diçe şûnewarên din.
Diçe wan axên ku qet naşibe cihê lê dizê.
Di nav yekîneya tevgermend a herêma Zagrosê ku li şikêr di wargehiya zivistanê de bû, kar û barekî bi ponijîn hebû.
Yekîneya ku pergalkirina biharê wê biçûya herêma Oramar, niqta şikêrî ya ku ber keviya avaşîn bû, bi xemgîniyê re têkilhev bi şabûnê li pey xwe dihêlişt. Di nava heftiyekî de amadekarî bi hendazetî û lezgîniyeke mezin pêk hatin. Beriya ku bigihêjin Oramar, li niqta Kaniya Ga ev der çar-pênc katjimêr ji niqta şikêr dûr bû. Derbasê amadekariya cuda bûn. Di ketina nav herêma Oramar da ku çalakiyekî li
99

dar bixin, ketin nav hewldana amadekariya. Wê rêya navbera Gever û Qerekola Oramar qut bikirana û li dijmin bixistana. Bi vî awayî herêma ku ji boyî eyaletê girîngiyek xwe yê stratejîk hebû, ji bo vekirinê wê gava yekemîn bihata evêtin. Ji ber vê yekê pêwîst bû ku amadekarî baş bihatana çêkirin.

Yekîneya gerîla ji du taqimên xort –her taqimek sê mange û taqimek bayan- ev ji du mange teşkîl bû û hêjmara xwe şêstûçar gerîla bû. Gava ku yekîne li Kaniya Ga bû, talîmata koordîna eyaletê hat, da ku ji hivdeh sitiyan, şeş heb vegerin û yên mayî jî bi bîçimê mangeyekî xwe bi rêkûpêk bikin. Ji ber vê talîmata ji nişka ve, yekîne xwe pergal kir û ber bi Oramar ve kete rê. Di navbera Gundên Kah û Şukê Birê de bihurîn, li Avaşîn xistin û bi şûtikan Latê Koh berdan Gundê Zêrî –ku çar aliyên vî gundî tev gir in- tîrêjên dawî yên tava êvarê xwe berdabû ser girên gund. Hindik mabû tarî bikeve. Ev gundê bêdeng û vala, ji ber cerdevaniyê nepejirandibûn koçber bibûn, darên hilû û gûzan ji ber bêxwedîtiyê qels mabûn. Lê hêjî bedewiya xwe diparastin. Yekîneya gerîla li ber keviya bexçeyan mange mange cih girt û ji bo bêhnvedanê navber dan. Xwearina xwe xwarin. Gundê Zêrî li wê herêmê gundê herî şêrîn û xweşik bû. Nêzîkê 40 malên gund hebûn. Di gund de yekemîn tişta berçavên mirov diket, dêr bûn. Ev dêr hundirê wan şikeft, derveyê wan jî bi kevirên mezin, lê bi awayekî rêkûpêk hatibûn avakirin. Ji demek nêzîk şûnde jî bi rengekî mizgeft hatibû bi kar anîn. Dîsa temamê xaniyên Gundê Zêrî mîna vê şûnewarî perestîje ku bi rengê mizgeftê dihate bikartanîn, bi kevirên mezin û çargoşe hatibûn lêkirin. Sê-çar odê wan hebûn û tevahî ban ji axê bûn. Ji xaniya çend hebek hilweşiyabûn, lê yên mayî mîna ku li hember heyam li ber xwe bidin, di cihê xwe de çik sekinandî bûn. Hêna jî zexim xwuya dikirin. Yekîne, li cihê navberdayînê zêde nesekinî. Pêwîstî hebû ku beriya bibe sehar xwe bigihînin latê, Dola

Xirabê ku ev der li sêkûça girên sertara Cîlo bû. Dihate wê wateya ku 9-10 katjimêr bimeşiyana. Bi çek û barên xwe yê 100

giran, xwe li Geliyê Xirabê xistin. Da ku derkevin girê herî bilind. Piştî ku bi zehmetî derketin girê bilind vê neqlê xwe berdane Gêliyê Viran. Ji vê derê re digotin; Dola Xopê. Gava ku li Geliyê Viran xwe gihandin ser kaniyekî, katjimêr sisê yê seharê bû. Bêhna xwe dan, lê qet nesekinîn. Matere û bîdonên avê dagirtin, ji Geliyê Viran ber bi Cîlo ve ji çend geliyên biçûk bihûrîn û di dawiya dawî de xwe berdan geliyekî kûr.
Serleşkerê taqima yekemîn hevalê Şahan, komekî ji heşt kesan amade girtibû ba xwe, li dirêjahiya girekî ku ev der di navbera Gundê Zêrî û Qereqola Oramar de bû, bi cih bibûn û dest bi karê keşfê û parastinê kiribûn. Yên li ciyê yekîneyê mabûn jî mange mange cîbicî bibûn. Du heb nobedar dergetin girê yaserî Geliyê Viran. Pişt re hevalên din ji bo vehesandinê derbasê rewşa razanê bûn, ji ber ku rêwîngiyeke dirêj û zehmet wana gelek westandibû. Tenê yek heval ranezabû, ew jî serleşkerê yekineyê Qivircix Hesen bû. Ji ber pora wî gustîlok û reş bû, vî navê lê kiribûn. Bejna wî ne zêde dirêj, ne jî kin bû. Di tevger û livandinê wî de çistiyek ber çav diket û ev yek hizir bi mirov re çêdikir ku gelek li ser xwe ye. Di nav axaftinên wî de tim û tim henekên hûrbijêr peyda bûn û gava ku ev henekên hûrbijêr bi dengekî zîz û cidî pêk dihatin di derbirîna wî de xet nedihatin xwendin. Ya jî têgihîştin bi herkesî nasîp nedibû. Ji bo henekên hûrbijêr

zîhnekî xwedî hêz pêwîst bû û ewî vê yekê di nav her zirûf û mercê zor de pêkdianî. Carna jî van henekan bi rengekî yarî jî bi kar dianî. Mirov di nihêrtina wî de pê derdixist ku li ba zîhnekî xwedî hêz, dilekî qirase û bi hedan pê re heye. Mirov digot qey ev herdu mifteyê jiyana bi raz û nepenî ye û jê re dibe hêz… Belkî jî… Erê!...
Tenê ew raneza bû, westa bû û pir bêxew bû. Ji bo şepitandina xewa ku kortika çavên wî giran dikir, agirek biçûk pêxistibû û ava çay Êli ser bi cih kiribû. Di dema ferecê de li şûnewarekî nû bûyîn bes bû ku dilnerehetiyê pê bide çêkirin. Ava çayê keliya. Gava ku nobedar li keviya riza
101

baxçe xuya kir, ewî ji dema nav kulma xwe diavêt nav çaydanê. Beriya ku rabe ser lingên xwe li benda hatina nobedar ma. Lezgîniyek li ser rewşa nobedar habû, lez bi lez û qut qutî diaxifiya:
-Hinek kes ji milê qereqolê ber bi gelî ve tên!..Leşkerên dijminin an hevalin, min pê dernexist!..
Qivircix Hesen li xwe da û rabû ser piyê xwe:
-Nobedarê dî lî ciyê xwe ye an na?
-Gava ez bi vir ve hatim ew nû diçû ciyê nobetê!
-Nexwe, niha ciyê nobetê vala ye…Derhal here ciyê nobetê! Ji milê qereqolê vir ve heval nayêtin! Ev çî sersorê ye? Şervanên nû jî, xeletiyên wisa nakin!..
Nobedar bi bazdan vegeriya ciyê xwe yê berê. Lê hê negihiştibû ciyê nobetê bû qarewana wî:
-Hevalê Hesen leşker ketin nav me!...

Leşker nêzikê 20 metreyî hatibûn ba nobedarê dî, lê ji ber şaşwaziyê gule lê neteqandibûn. Serleşkerê yekîneyê Qivircix Hesen di nav mangeyan de diçû û dihat.
-Rabin!. Rabin!
Bi destê xwe geliyê milê Cîlo nîşan dida.
-Bi jor ve derkevin, lez bikin! Zû, zû!...
Yekîne, beriya ku pê dihese ka çi lê qewimiye, hema kê çek û çentê xwe girt, ber bi ciyê nîşan dayî re beziya.
Qivircix Hesen xwe li dawiyê hişt, li balê serleşkerekî mangeyekî hebû. Qivircix Hesen li dora xwe nihêrî herkes çûbû, pişt re ji nedîve ji serleşkerê mangê pirsî:
-Ka hevalên sitî? We wana şiyar kir an na?
-Heval, wana kesî şiyar nekiriye!
-Wey xwedê qehra xwe li we bike! Ev nehate bîra kesî!..
Çavên wî sor bibûn, kulma xwe ji ber hêrsa xwe dihejand. Berê xwe da serleşkerê mangê û jê re got:
-Çend havalê bi dil bila werin, em hevala ji nav dijmin derxînin.
Qasek şûn de, heft heb gerîla derketin û hatin. Di nava wan de “ez jî, ez jî!...” Sehnekirin û lexistin û çûn.
102

Dema ku ji bo parastinê koma gerîla xwe berda gelî, sitî di cihê xwe de hê razayî bûn. Dema Qivircix Hesen hem li ser wan, hem jî li ser leşkeran bû, bêyî ku pê bihesin dîtin ku di nava dorçepera dijmin de ne, êdî wisa li wan hat ku neguncaw bû ji nav dijmin derbikevin. Bi cihaza dest pêwendî bi hevalên dî re çêkir û rewşê ji wan re vegot. Wê

gave jî hevalên li jor pêwendiya cihazê bi muhabera eyaletê re çêkirin û di derbarê operasyonê de agahî dan eyaletê. Bêyî ku dereng bikeve bersiva eyaletê bi rengekî talîmat hat:
-Çi dibe bila bibe, lê divê hûn Qivircix Hesen ji nav dijmin derxînin.
Êdî dên û bala hevalan li ser koma ku ji bo alîkarî çûbû bû. Hemû kesî vê pirsê ji xwe dipirsî "wê bikaribin dorpêçê biqelişînin an na?" Tav diqulibiya, reşî diket û sî xwe zêdetir pan dikirin. Xweza bi hatina êvarê xwe terkeserê tenêtiyekî dikir. Ax sar bû, her tişt di nav sarbûn û tenêtiyê de stûyê xwe ditewand. Hemû kes li benda nûçe û agahiyan bû, ji nişka ve parazîta cihazê bilind hat:
-Demhat! Demhat!...
-Heval, gohdar im!
-Heval, derketin pir zor e, pir zehmet e!
-Belê!
-Lê emê bicerbînin!...
Beriya ku serleşkerê taqima hevalê Şahan bersiv bide, li dora xwe nêrî temamê çavan li sirt bû. Dirêj û kûr fikirî. Yên hawîrdor tev meraq dikirin ka wê çi derkeve ji devê wî. Di jiyana xwe de biryara herî zor dabana, lê pir zehmet dihat. Pêl mandalê cihazê kir, di tariya êvarê de roniya cihazê a heşîn dida rûyê wî, bi dengekî nizim got:
-Baş e, hate fêmkirin!
Katjimêr derbas bûn. Dengê çekan her ku diçû kêm dibûn. Bayekî pir sar, rûyan mis dida. Katjimêr bibû neh, koma ku li hember girê mevzî girtibû di cihazê de bang dikir:
-Demhat, demhat!

-Gohdar im.
103

-Heval heya katjimêr yazdan xwe bigihînin me, em diçin, jêr re jî bibêjin bila xwe bigihînin me.
-Baş e, hevalên din?
-Operasyon pir berfireh e, pêwîste beriya sibehê em xwe bigihînin cihekî stratejîk.
Serleşkerê taqima hevalê Şahan, ji yên jêr re got, pîlên cihazê Êlî ber qedandinê bû her du aliyan de şidand.
-Hate fêmkirin?
Pişt re çend hep pirs li ser hev rêz kir. Lê belê ji hêla din tenê dengê perazîtê hat. Çend car dubare kir, lê hewldana wî bêbersiv ma. Pêwendiya cihaz bi yên jêr re qut bibû. Katjimêr dehûnîv bû, hevalan girte ba xwe û çû aliyê din. Koma alîkariyê hê jî nehatibû. Katjimêr bibû yazdeh. Stêrk li asîmana diçirûsiyan. Hê heyv derneketibû. Bêhedaniya koma gerîla zêdetir dibû. Hevalê Şahan xwest ku careke din pêwendî deynê, lê hevalê Dilovan bersiveke neyînî dayê:
-Pîl qediya ye!
-Her du cihaz jî pîlê xwe qediyane? Baş e, emê çi bikin?
-Gava em dikevin ser rê, em dikarin hevala rêkin ser depoyê!
Hevalê Şahan bersiv neda. Bi wateyeke baş e, serê xwe hejand. Koma ku çûbû jêr hê jî nehatibû. Hevalê Şahan, nêrînê tevahî gerîlayan girt. Nêrîna giştî ew bû ku heta katjimêr duwanzdehê bisekinin, ger ku newêtin birêkevin. Qut û qutdengê guleyan dihat. Weke ku xeberdarê nîşana

tiştekî xirab be, di nav tariyê de hîsek bi mirov re çêdikir. Ji dûr ve dengê çeqelan dihat. Mirov digot qey xeberdana qedandina pevçûnê dide. Êdî dem nîzîkê nîvê şevê dibû. Koma alîkariyê hê jî nehatibû. Bêçare ketin ser rê. Pêwîstî hebû ku bilez şûnde bikişin. Hevalê Şahan ji rêberê komê re got:

-Baş e, dest bi meşê bike!

Koma gerîla di halê yekrêzî de kete ser rê û meşiya.

Axaftin û deng qut bû. Serleşkerê taqimê Şahan, xwe gihand ba rêberê komê û bi lezgîn talîmata xwe da:

104

-Bi baldar bimeşe!. Qet nesekine!...Pêwîste em beriya komê seharê bighijin ciyê xwe. Heta ji destê te tê zû bimeşe!.

Vê neqlê jî meşiya ber bi dawiya komê ve. Peşengê komê çeka xwe dixwest bi cih bike li ser milê xwe, lê ji ber giraniya barê xwe nizanibû çi bike.

-Baş baldar bin, kes qut nebe, zû bikin hindik maye bibe tavehîv!

Çirên li hember nîşan da. Ronahiyek diyarî peyda bû, di navbera xeta ser gir û asîman de. Li ser girekî bilind keviya heyvê xuya dikir.

-Xem nexwe heval, kes li paş namîne, temamê hevalan xurt in!

Rêya wan ber bi Gundê Zêrî ve diçû. Gava ku di nav malan û bexçeyan de bihûrîn, heyv li yaserê wan bû. Nesekinin. Beriya sehar vebe, pêwîstî hebû ku xwe li girên hember bixistana. Dema ku gihîştin wan giran hêdî hêdî ronahî

vedibû. Stêrk li asîmana nemabûn. Tenê stêrka seharê xuya dikir. Heyv li asîmana mîna meşaleyek ber tefandinê bû. Ev sê rojbûn koma gerîla dimeşiya. Di rojeke bihara nû de, seharê zû xwe gihandin niqta kaniya gûzê! Êdî dengê çekan ji dûr ve jî nedihat, li her derî bêdengî serdest bû. Yekemîn car yê axifî Şahan bû.

-Em saxlem gihîştin, ev baş e!... Lê hevalên din…

Keserekî kûr kişand. Pişt re Xeyrî axifî û pirsî:

-Em devriye derxin an na?

-Rast e, du hevalan bigire ba xwe, bi dûrbînê keşif bike!

Ji bo devriyê Esenya jî xwest ku biçe. Vê yekê li ser wan ferz kir. Şahan keniya û got:

-Ji bo ku tu gavên mezin bavêjî pêwîste hinek mezin bi-bî. Hê tu biçûkî, li paş wan bimînî ne baş e!

Esenya bi derbiraneke ji xwe bawer lê vegerand:

-Bila qet gumana te nebe, li paş namînim.

Yên din bêçare lê bi dengekî hêrs got:

-Baş e, xwe amade bike, em diçin!

105

Esenya pir şa bibû, bextiyarî ya wê di rûyê wê de diyar dibû. Xwe bi xwe re digot:

-Li vana binêre, xwe çi dihesibînin! Hewqas rê meşiyam li paş nemam, ma di devriyê de bimînim?

Yên ku diçûn devriyê ketibûn ser rê. Nêzîkê du katjimêran meşiyan, ya ku yekemîn car di nav daristanê de dengê lingan bihîst Esenya bû. Ji koma devriyê Hogir qîriya:

-Ew kê ye?

Hema di cih de bersiv hat:
-Heval heval!...
Fêm kirin ku hevalên wan yên di dorpêça dijmin de mabûn bûn. Ji kêf û eşqê devê wan qîç bibû. Ji wana kirî, di navberê de sal derbas bûne hewqas germ hevalên xwe hembêz kirin. Dilê wan hewqas rehet bibû ku, axaftin ji devê wan çênedibû.
Esenya berê xwe da Hogir û got:
-Min ji te re negotibû, hatina min ji bo koma devriyê oxir e, oxir!
Tev bi hev re keniyan û berê xwe dan ba hevalên xwe. Di rê de jî tiqe tîqa Qivircix Hesen bû û henekên hûrbijêr di nav axaftinên xwe de bi cih dikir.
Rojîn Zaman
106

ÊVAR DERYA
"Mejî, hest, hizir û raman hemû ji karkirinê rawestiyan. Weke ku bêhndana havînê de ne."
Şev ji me re berg e, bi roj jî xewa di hembêza latên ku li vir û wir hilkişiyayî wekî şaxên ga yên ber bi ezmanan ve de. Çenteyên ku bêhna xwîdan, hilma nanê sêlê û tama xwê jê tê ji xwe re dikin balîv û palgeh. Em ezmana nakin mitêl (lihêv) wekî ku hozan û stranbêj li ser me dibêjin!! Baranpoş ebrîşîmê me ye, dolbend (kefiye) jî istebreqê me ye, ku havîn û zivistanê bi me re hevrêtiyê dike, êdî bûye parek ji jiyana me a herdem.
Jiyana me ne gelek bi nakok û serheve, ne jî belave û

bêpergale; giyan û naveroka hevaltiyê şêwazê jiyana me ye. Rojekê li vir û roja dîtir jî li yek cihekî ku lingên me ên bi hedar, weke hedara H. Eyub, me bigihînê.
Her tişt li vê derê bi du aliyê! Her tişt dijminekî neyare û heman demê de, hevalekî dilnaz e; av, agir, çeka ku te diparêzê û heman dem de jî dikare xala kutahiyê ji bo jiyana te dayîne û heman tişt jî ji bo hemû tiştên ku li dora tene yan jî bi tere ne.
Her ku em dighîjin gewriya çiyayekî bilind, yan jî girekî ji girên ku ber bi erşa yezdanan ve bilind bûyî dibin, vinvina û xûşxûşa dengê bêsîman weke baranê tê gohê mirovan; di navbera yekîne, tabûr û bîryargehên ku li nava çiyan belav belav in; her yekê ji wan navekî xwe ê cuda cuda heye (Qendîl, Kawa, Botan, Herekul û hwd...) Ev yek jî dihêle ku em (grupa rênasa) dilşad bibin, û bi hêviya ku bîryara şandina
107

me ji bo erkekî da Besta, ber ku ev bû demeke dirêje me hîn hevalên xwe ên wê derê nedîti ne. Lewra her tim me bi bendewariyeke mezin li hêviya wê bîryarê bûn.
Demê ku hûn bi lutkên berz de hilperikîn (hilkişiyan) tu car li jora xwe mêze nekin; ber ku ew yek dihêlê ku mirov westa bibe û ji wî lutkî bitrse, gihiştina lutke jî ne mûmkun dibîne. Lewra pêwîste tu gavan bi lez bavêjî û bi xwe re bêjî "Ev lutka gelek asan û besît e, ezê niha bigêhêjim serê wî lûtkî ye."
Çendî ku lutke bilind û çetîn be, gîhîştina serê wî lutkî tiştekî gelek xweş û cuda ye, nikarim bi çend peyvan re wî

hestî dadibirînim. Ked û westabûnê, hêl û vejeneke mezin ji te sitandi ye, westabûneke ku galte pê nabin. Xwîdana ji laşê te yê germ heriki ye, li te weke cawekî teze ji avşû yê dirxistê ye dike.
Lutke; çi pêzanînên te heye li ser lûtke?... Nîgareke bilind, li bin jî kendal û newalên kûr, ên ku devê xwe weke tîmsahekî birçî -bo hemû kesên bi lûtkan ve dihilperikin- vekiri yê! Hişyar be bo tu nekevî; tê weke zebeşekî hencirî bibê ye, ew jî berî ku tîmsahê birçî perçeyên te ên ma yî ji xwe re bike firavîn!
Demê ku tu dighîjî lûtkê herî bilind di herêmê de, bi dilşadiyeke mezin hîsdikî; dilşadiyeke ku ji kurahiya mêjuyê mejiyê te dertê. Mêjuyê ku ji keşta Nuh û ço yê Musa -bi hezar salan- kevntir e. Li hawirdorê temeşe bike, cihan hemûkî di bin lingê teda ye. Bajarên dûr, birqandina fener û çirayên bi xembariya xwediyên xwe dilşadin, rêkên xwar ên wekî marmasiyên avê li ser rûpela tobghrafiya hatine kişandin û deştên kapikî û belek ku weke welatê satrencê li ser xaknîgarê rêxistandî xuyadike. Tiştekî gelek şanaz û bihter e, demê ku tu çavdêriya cihana di bin xwe de dikî!! Weke ku tu di keşteke ezmanî dayî... Hun jî azmûn bikin ku rojekê bi lûtkekî bilind ve hilperikin û bi xwe azweriya vê yekê bibî-nin...
108

Li pêşiya te gelek lûtkên bilind û newalên kûr hene; evrazî û sernûşûvî, rabûn û daketin. Ev e zagona jiyanê, bilindbûn û nizimbûn!!

-Berwar berwar, berwar... berwar.....
Dengê banga bêsîmê ez ji avjaniya di olgeha deryayên lazewerdî ên aşopan de şiyar kirim. Bêsîmê bihedarî û li serhev bangî min dikir.
-Belê belê, kî bangî berwar dike?
-Berwar! Ez im- ez, Sîpan. Tu dengê min digrî?
-Rast e Sîpan.
-Silav û rêz.
-Silav û rêz Sîpan.
- Tu li kû derê bû yî? Min qenalek nehîşt û ez li te digerim e?
-Vaye em êste gihîştin nûqta Patata!
-Berwar, ku tu jivana me nasdikî ka biçê yî?
-Belê! Ez nasdikim.
Yekser min bêsîma xwe bir ser qanala ku berê me di nava xwe de diyar kiribû.
-Berwar! Notekî min a lezgîn ji we re heye.
-Fermo, gohdar im.
-(M/ 7 hene. Di h4 b..... por dirêj!!! Kv 20.... û ...!)
berwar! Ma te fêm kir?
-Belê Sîpan! Fêm bû. Tiştekî din dibêjî?
-Na spas berwar. Serkeftin ji we re.
Çawa ku min bêsîm ji destê xwe danî, yekser havalên min weke mêşên hêngiv li dora min kom bûn û bagerên pirsan bi ser min de berdan.
-Ka bêje, Sîpan çi dixwast? Emê bi kû de biçine?
-Gelî hevalên hêja! Hûn dizanin berê me li kû derê ye?
-Ma emê çawa bizanibin e? Ka de bêje heval… bilez….

-Bila hevalên hêja xwe amade bikin û berê xwe bidin Besta yê….
-Min hîn gutinên xwe bidawî nekiribû, yekser ken û dilşadiyeke mezin kete nava hevalan; ji ber ku gelek bêriya

109

hevalên Bestayê kiribûn. Lê hevalê herî balkêş di vê yekê de, hevalê Şiyar bû. Dema ku me sedema dilşadiya wî ya evqas mezin jê pirsiyarkir, wiha bersîv da;
-Hemû nivîs û defterên min li Besta yê veşartîne, wê ev firseta derfeta dîtina wan nivîsan car din bidê min …
Hevalê Ferzad, kete navberê û got:
-Jibîr bike heval! Şeytan bixwe jî niha nizanê ka xezîneya te ya buha li kîjan derê ye. Dibê ku niha di bin erdê de rizayî ye…
- Na heval Ferzad! Min di cihekî hêmin de veşart, her wiha jî ez wî cihî gelek baş nasdikim…
-Ev edeta me ya her carê ye… Dinivsînin, dinivsînin, her tiştî dixin deftera xwe, helbest, bîranîn, rojane û çîrokên xwe… lê belê hezar car mexabin! Çawa ku dijimin derdikevê çiyan û şer dertê, yekser em defterên xwe weke termekî mirî dixin zikê gorên teng û tarî, di nav kevr û zinaran de vedişêrin, bi hêviya ku careke din lê vegerin… Lê belê, yan emê şehîd bikevin, yan birîndar bibin û heremê ji binî de bighurîn. Hop… her tişt li ber ba çû!! Ku erd her tiştê me dixwe, zikê wê tu car têrnabe…
-Tu car ez bêhêvî nabim… Ezê ji nûve wan defterên xwe derxînim û ji bo çapemeniyê rêbikme, belkî ji bo weşandinê

guncaw bin
Hevalekî bi awayekî matmayî û galtewarî ji heval Şiyar
pirsî:
-Heval Şiyar! Ma ev nivîsên te gelek mezinin, weke ro-
mana Mamişoğlu ne?
- Na na heval! Min li ser jiyana yekîneyeke gerîla di
heyama salekê de, bi çalakî, bûyerên baldar, şehadeta hevalan,
riva çend xayînan û hinek helbestên xwe nivîsandi ye
- Te li ser kîjan çalakiyê nivîsandibû?
- Min babeteke berfireh li ser çalakiya "Deryê Qaçê"
nivîsand û li ser çend çalakiyên dîtir.
- Çalakiyeke gelek mezin bû…
- Heval Avareş ! Ma tu beşdarî wê çalakiyê bû yî?
110

-Kêmekî… « Ew çalakiya berhema ked, raman û
tektîkeke gelek mezin û jîr bû, derbeke mezin di hundirê dilê
dijmin de lêxist, difna dijmin xiste bin heriyê, hîşt ku ew
duvika xwe bikşîne bin çaqên xwe û bêveger ji wir birive… »
Di vê dere de hevalê Kawa – ê heya niha bêdeng bû- xwe
xist nav germahiya vegotina nêrîn û bîranînan : « Leşkerên
dijmin weke kevroşkan direviyan !! Nêzikî nodî mirin, gelek
ji wan xwe ji kendalên – ku weke quçên gayên mezin in-
avîtin. Serê wan weke zebeşan ku ji serê Hemedê Oso ketibûn
dipelixîn. Leşkerên ku ji ber narincok û guleyên me filîtîbûn,
bibûn mevandarên gelî û kendalên kûr, ên ku hembêza xwe
fireh-fireh ji wan re vekiribûn « Bi xêr hatin, ser serî û ser ça-
van re hatin, fermo. Ezê we ji rovî û çeqelan re bikim e şîv û

paşşîv ! »
-Lao heval ! hemû dîn û gêj bibûn… Jixwe piştî wê bûyerê, serkirdetiya dijimin neçar ma ku hemû leşker û serleşkerên heremê bighurînin »
-Ku ne hevkariya hemû yekîne û hêzên heremê ba ev çalakiya mezin bi ser nadiket… !
-Rola wê çalakiyê di bilinkirina moral û erwê hevalan de gelek hebû, bi taybet jî piştî ku her kes li ser şehadeta hevalê Rojhat xemgîn û bêzar bûn.
-Hevalno ku hûn amadene, em dest bi rê bikin, dereng e, heval niha li benda me ne…
Bi nîvbûna rojê re, em gihîştin nêzî gundekî wêran û barkirî, ku ji hovên lawirî ,mirovên hov ji cerdevan û leşkeran re bêparastin û bêdergîvan mayî ye. Ev gund û gelek gundên hawirdorê berê ji bona şoreşê piştîvaniyeke mezin di hemû aliyan de dikirin, lê xebînete ku niha bûye lîstikgeha hov û lawirên çolê ye.
-Em nêz bûn hevalno! Ka kêmekî em bilezînin. Lingên min ji erdê gav dixwarin, min hîsdikir ku kêm mayî ye- ber ve şûnwarê gundê ku biaramî di hembêza dayîka xwe ya jîngeh de bi narîniyeke bêzagon û bêpanusk de razabû- ku ezê bifirime! Min dît ku dumanek ji xaniyên gund derdiket
111

ezmana, min di dilê xwe de got:“ev hevalên me çiqasî bêxem in, nehişyar in, tu dibêjî qey derketina seyranê li kenarên çemê Firatê!! „. Bala min ji hemû tiştî valabû, tenê di mejiyê min de dîtina hevalan- ku ev bû demeke dirêje me ew medîtine- hebû.

Vê yekê jî hîşt ku ez gelek bilez ber bi gund ve biçim. Min her bêhtir dilezand, bi sedan hizir û hestên curbecur weke pêlên agirekî gur di bin çilkên baranê de dilîstin di mejiyê min de diçûn û dihatin… Çawa ku ez gîhîştim ber xaniyê despêkê, bi hêviya ku yekser ez hevalan hembêz bikim, lê, Yekser bizav û libatên min di cihê xwe de hişk bûn, li min weke putekî ji kevr afirî hat, bêamar hest û gisikên gur û har di mejî yê min de bûne mêvan! Birusk, bager, ba û ziryan di mejiyê min de tar û bar, har û dîn bûn, weke ecacê deşta Sirocê û Herranê bûn. Vê sprîzê zimanê min bi girekorekê xirpoxe kir, çilkên xwîdana sar weke çaviyan ji memleketa laşê min ê kevirî diherikîn… Mejî, hest, hizir û raman hemû ji karkirinê rawestiyan.
Weke ku di bêhndana havînê de ne. Ê ku yekser li hembera min weke stunekê disekinî, tenê di navbera me de çend gav hene, wî jî bi sersamî û matmayîyeke bêhempa li min mêze dikir, li wî jî lerzîn, tirs û bizîn bibû mêvan. Ez bawerim ku me herdu yan jî baweriya me bi rûniştina Hîtler li ser kursiya papazê Vatîkana Roma hebû, bi firîna çêlekan di ezmana de hebû û dîtina stêrkên nîvro hebû, lê belê ku bi vî nêzikî de, rûbirû li hemberî hev weke keviran bisekinin, me tu caran ev yek hizir nekiribû.
Min hilmên henasa wî ya germ û bêzagon li rûyê xwe hîs dikir, di navbera me de tenê du-sê sapên zirav hebûn, sînorê di navbera agir û barutê de, roj û tarî yê de, di navbera erê û na de… Di navbera mirin û mayînê de! Bi awakî netebitî li min dinêrî, dizanibû ku em di çi rewşê de ne. Min amartina her saniyekî bi hemû beşên wê dikirin!! Min têderxist ku dema min û rabûna bi çi tiştî nîne. Wî jî bi rûyekî zaroktî ê bêfam û

serê kurkirî li min dinêrî. Di jiyana min de ev cara yekeme ku ez dikevim rewşeke wisa, rewşeke pir çetin û bêrehm de mam. Xendeyeke melul li ser rûyê wî ê di bin komê qimijokî û cilên 112

belek derhat. Min re hat weke ku ew xendeya, dibêje „ Silav li temen û jiyana te ya bûrî, êdî dawiya te hat“ maf ê wî bû, insiyatîf di destê wî dabû, despêk û dawî di devê loleya MG3 a ku arasteyî sîgê min dabû, jixwe çeka min li milê min de daleqandîbû, derfeta kişandina çekê tunebû. Min li rûyê leşkerê ku weke sîhê li pêşiya min disekinî ye mêzekir. Di ber çavên min re her tişt weke biruskê derbasbûn, rûyê dayîka min ê westayî ku bi destê xwe ê narîn li serê min dixuşand, dibistan û demên zaroktiyê, şer, mirin, çalakî, hevalên şehîd ên ku min bi destê xwe ew binax kirin û her tişt bêzagon, tevîhev derbas dibûn… Nizanim! Lê min awêneyeke cuda di rûyê wî leşkerê burjuwazî de dît, nermatî û nezantiya bajarvanî yê. Min di dilê xwe de hana (dua) dikir ku hevalên min neyên, bo ku ew jî wekî min nekevin çembera dijmin.
Ez li xaleke lawaz û derfeteke biçûk -bi qasî serî derziyekî- ji bo rizgarbûna ji vê belê digeriyam. Heman dem de dengek ji pişt leşker ve hat, komek cerdevan bûn, dema ku çavên wan li min ketin, yekser kenekî weke ê çeqelan li ser rûyê wan ê weke ewrên bêbaran de derhat, diranên wan ên reş û kurisî di bin simbêlên wane kujul de xuya dikirin, te digot qey nû ji ser xwarina fişqiyan rabûne!
-Ka wî terorîstî bikuje… “haydi vur asker, vur sana… „ ka wî bike weke patatayê kelandî…“çabuk asker bitir bu terörîs-

tin işini „
Cerdevanan dest bi dijûn û xeberên pîs ji min û şoreşê re kirin… Min dît ku leşkerê Tirk tiliya xwe da ser tetikê bo ku xala dawiyê ji jiyana min re dayne…“ lê na û hezar na, ey kesên bêrûmet ez bi asanî namirim!! Ji bo hemû kesên baş, ji bo hevalên xwe ez namirim… ku hun çibikin jî lê ez namirim „
Ez li derfetekê digeriyam bo ku ji mirina jêneriv bifilitim. Heyama di navbera derketina gulê ji devê loleya MG3 ê ta gihîştina min gelek kêm e, tew nîne! Yanî rizgarbûn weke aşop û rewrewkê diyar dikir!! Çerxa rojgarê a lezgîn zivirî, … û tiliya xwe bi ser tetikê de dagirt, êdî mirin hat!!... Lê ew deng û biruska ku ez li bendê bûm çênebû… guleya yekem
113

çiruk derket… Leşker jî matmayî di şûna xwe de cemidî… Yekser, bêyî ku demê winda bikim, bi hemû hêz û vejena xwe dest bi revê kir, lê min nişkav de xwe li qeraxa kendalek kûr dît!! Lê bêyî ku ez bi çi tiştî bihizirim, bê yî ku li ser encamê bifikirim, yekser min xwe ji ser wî zinarê bilind avêt jê rê… Çawa ku ez li ser erdê hişk û biring ketim, hemû hestiyên min weke kayê lê hatin, hemû laşê min weke hevîr bibû… Lê tişt nabe, ne xema min e, niha jî pêwîste ku ez ji vir birevim. Heyanî ku leşker û koma cerdevanan hatin ser hişê xwe û ji wê sprîzê derketin, dest bi gulebarana bê serûber li min kirin… Di navbera saniyan de min dest bi revê kir, ez weke bayê dibeziyam, bêyî ku guh bidime kevir, dar, strî û barana guleyên agir ê ku ji her mil û alî de dihatin… Gelek gule li kevir û latên derdora min diketin û bi xwe re qîjînî, ax û toz

radikir ezmanan… Êlegê min ji sedema bayê bezê lê wekî pereşutê hatibû, guleyan gav bi gav bi min re tevdigeriyan, min didît ku gelek pizotên agir di elegê min re derbas dibin. Armanca min ew bû ku xwe bighînim dola jêrê.
Çawa ku ez gîhîştim nava daristanê, min dît ku agirê guleyan ber ve hêzên dijmin tê,“bijî hevalên min ên qehreman „. Hevalên min, ji bo ku bala dijmin bikşînin ser xwe, dest bi êrîşê kirin… Ev yek jî bo sedema ku ez heman heman ji bin rehma agirê dijmin bifilitim. Min di nava daristana tarî de, komek heval (ên ku em ji bona wan hatibûn vir) dîtin, kêfê min gelek xweş bû.
-Heval! ka zû were vê derê, bilezîn e.
-Bi xêr hatî heval, maşalê çi nexweşî bi serê te de nehatî ye? Tu birîn bû yî?
Wê demê êdî ez bi azareke weke agir di tenişta xwe ya rastê de hisiyam, min mêze kir ku xwîna germ jê diherikê… Lê ji bo dilniyatiya hevalan min xemsarî nîşan da:
- Çi tişt nîn e, ez baş im baş. Hun çawan e? Maşalê hûn neketin çembera dijmin?
-Na! Nexêr, me tedbîrên xwe girtibûn.
114

Heman demê de, hevaleke keç bi xembarî ber bimin ve hat û got:
“Bibûrîne hevalê hêja, em bûn sedema beleyê ji bo we, ji rûyê mede tu jî birîndar bû yî… Me bi serê we de bele anîn…”
-Na heval bepirsgirêk e. Ev karê me ye, çi gunehê we nin

e… Ka titun li gel we heye, dilê min cixarakê dixwaze !
Demek derbas nebû da ku dengê hirhura Kobrayê ji der-
dorê de hat. Agirê xwe berdida cihê hevalan, her wiha jî car
car davêt nava daristanê bo ku me vekişînê libtandinê, lê em
nehatin lîstika wî. Hevalên me li rexê dîtir şer germ kiribûn, ji
sedema ku ew û leşkerên dijmin di nava hevdabûn lewra Ko-
bra nikaribû bi serbestî cihê wan gulebaran bike. Hevalan
dixwastin ku dijmin bi xwe re mijul bikin ta ku em xwe ji wê
dolê derxînin.
-Hevalno ! Ka bi bêsîmê bi hevalên me re biaxifin da ku
xwe bikşînin hêmnatiyê, bila jiyana xwe nexin xeteriyê (Lê
min hevalê xwe baş nasdikirin ku tu car bi asanî dev ji şer
bernadin, jixwe ev bû demeke dirêje ku ewna li derfeteke wisa
digerin bo ku dilê xwe rihet bikin, lê dîsa jî pêwîste ku jiyana
xwe biparêzin.)
-Bibûrîne heval ! em nikarin bi wan re biaxifin ; rewş ge-
lek xeter e pêwîste ku em biçin alîkariya wan.
Çend hevalan berê xwe dan cihê pevçûnê, di heman demê
de firiniya moşekekê hat û li ber me teqiya, duman û ax avête
ser me.
-Ez bawerim ku cihê me têderxistin, pêwîste ku em hemû
ji vir derkevin.
Lê ji şansê min ê xerab ku birîna min her çû xerab bû û
azarî bêhtir bûn, lewra ez neçar kirim bo ku du heval bi min re
biçin cihekî dûrî gule û narincokên dijmin. Çendî ku min ev
yeka nepejirand jî lê dîsa hevalan daxwaza min nepejirandin.
-Na hevalê hêja ! tu birîndarî, pêwîste ku tu xwe biparêzî,
ê dîtir jî emê çareser bikine, baweriya xwe bi me bîne…

Xwîna min her diherikiya, tiştekî ku me bida ser tune bû, hevaleke keç, fanêleyê xwe qetand û ji min re kir pêçek, vê yekê jî hîşt ku hestên hevaltiya rast di dilê min de bikelin û dilê min li ser hevalên min bişewitê.
Çi ne xweş e ku hevalên te di tekoşîna di navbera mirin û jiyanê de ne û tu jî li vê derê di bin zinarekî de xwe veşêrî. Ez bêzarbûm, maşalê çi nebaşî bi hevalên min neyê. Ax xweska ez niha li gel we bama. Lê heya ku roj neçe ava, ev şera ranaweste !
((Ey mehrîbanê şanaz û mezin, wê çi demê ev roja avabibê ye, ku dêla kirasê xwe ê sor û zêrîn bi pê xwe ve bix-uşîne pişt asoyên bi ewr ? Ji ber ku em tarîtiyê baş bikartînin, dijmin jî vê yekê dizanê, lewra newêrê di taritiyê de bi me re şer bike! Ka bilezîne ey roja pîroz, ka zû biçe mala xwe! Ey roja ku ji despêka afirandina gerdûnê de roja îro her tim bi ser me de gizingên xwe ên germ û narîn didî, vê xaknîgara ku bi te tebarik dibe, ronahiya te ya ku dibe awêneya dil û hêviya hemû evîndaran, tu her tim ji pêxember û dilpakan re dibûyî rêber û ronî, ji kerema xwe kêmekî bilezgînî avabe, hevalên min di tekoşîna jiyanê li dijî mirinê de ne. Dilnaziyê bi me bike ey roja pîroz, ne tenê ji bo me ; lê ji bo ew dayîkên ku li paş van çiyayên bilind bi hêviya dîtina zarokên xwe rojan di-jmêrin))
Ev çîroka bi dawî nebû, lê belê rojgar ew bê heşyarde de çîroka me sekinand ; belkî ku rojgar car din ev biryara xwe li dîwaran bixe, ku denê lîstik û xelatên me ên zaroktiyê derxîne.

Giyanên me ên li paş ewrên çiyayên pîroz veşartîne, bi hêviya ku kevir bibin aveke zelal da ku têhna me bişkîne ! Ezê ku ji roja ji Meşyana ketim, li qurtek av, bo têhbûna xwe bişkînim digerim. Ez rewrewkeke xapanok naxwazim. Naxwazim ku giyanê xwe ê di olgehên hertiştî de bixapînim Min tê derxist ku lûtkê her tiştî bervaja wî ye !!

Pola Can

116

AX Jİ XWÎNÊ,

HÊZA XWE DİGİRE

“Ber dilê min pir şêrîn e Wek kulîlka bi hilm û bêhn e Dilê min bûye evîn eWez bi evîna te nikarim Hela were şêrinê Derman bike birînê”

Hevaltî çi ye? Heskirin çi ye? Ev herdu pirs di anîna ziman de pir hêsanin. Lê di kûrahiya xwe de pir watedarin. Du pirsên ku Şoreşa Rizgariya Netewî bi xwîna salan a pakrewanan avdayê û hîna jî av dide, du pirsên ku di bin alewên agir û ronahiya wan ezmanê tarî, ronî dike û mirovan serxweş û sermest dike. Ger destek dirêjî wate û pîrozahiya herdu pirsan bibe, bêgûman ew dest ku pola jî be, wê were birîn. Ew herdu peyv (hevaltî û heskirin) bi sala bû, mîna gerdena sûkra bûkekî, di dilê şervanên azadiyê de bi cî û daleqandî bû. Bi sala bû gerîla li çiyayên serbilind, mîna agirê Zerdeşt van gotinên pîroz, dihebandin. Hevalan bi dirêjahiya 15 salên şer li ser van gotinan, çeka xwe dikirin alava tevnê jiyaneke pîroz. Bi sedan, bi hezaran kes bibûn qurban ji bo parastina wateya rasteqîne a van gotinan. Te

digot qey wateya hevaltiyê bûye hz. Îbrahîm Xelîl û ferman dide, wisa şervanê azadiyê xwe dikirin qurban.
Çalakiya Bamernê ku mîna morekî şûna xwe li başûr hişt, ji bo pênc pepûlan, pênc sitêrên ji dilan rijiyayî, pênc rêhevalan dihate lidarxistin. Pênc lehengbûn ku, bûne kaniyên xwînê û tîna xaka welatê li ber xwe dan, şer kirin û di dawî de tevlî refê pakrewanan bûn. Ew pênc heval ku bi
117

birîndarî dikevin destê PDKê de, piştî îşkence kirinê, bi destê pêşmergan têne şehîd kirin. Li ser bingehê tolhildana van pênc hevalan, me biryara êrîşkirina li ser Bamernê da. Heya wê çaxê peyvên heval Xoşnaf ku yek ji her pênc hevalên şehîd bû, di gohê me de deng vedida. Heval Xoşnaf dema ku birîndar bû, bi cihaz ê bêtêl pêwendî bi me re çêkir. Wî bang dikir ku heval wan xilas bikin. Mixabin êdî wext derbas bibû. Hêzê îxanetê ew tev şehîd xistibûn. Piştî wê bûyera dilbiêş, me dest danî li ser Bamernê kire armanca çalakiya xwe. Berî roja çalakiyê, ew çend roj bû ku me amadekarî di-kirin.
Bajarê Bamernê dikeve herêma Behdînan. Ew demek dirêj bû ku dijmin ew bajar mîna devereke bingehîn a êrîşkirina li ser gerîla bikardanî. Derûdora bajar tev bi tangan hatibû xemiliandin. Ji ber girîngiya wî bajarî me êrîş li ser wir, kir armanc. Wate di şûneke wisa stratejîk de, me dixwest ku çavê îxanet û dijmin bi tirsînin.
Plana çalakiyê bi çar taburan hate amadekirin. Ji her reng û şêweyê haziriya çekê gerîla, dihate kirin. Ew cara yekem

bû ku, bi hejmareke wisa zêde çalakiyek wê bihata kirin. Berî roja cengê bi çend rojan, keşfeke dorfireh hate kirin. Encama keşfê, armanca çalakiyê dida diyar kirin. Pêwîst bû ku senger li nêzî bajar werin kolan. Cihê rêveberiyê wê sê kîlometre jora Bamernê hate nîşandan. Grubên êrîşê, parastin û alakariyê jî cihên xwe nasîn. Hevalên pusuyê (xefik) jî şûna xwe fêr bûn ji bo ku di dema çalakiyê de, ji deverên din alîkarî ji dijmin re newe, girtina reya ji Zaxo tê Bamernê, rêya ji Qadîşkê, Enîşkê û Şeladizê ve tê Bamernê, wê were girtin."

Li ser bingehê plana li jor, me tevî çalakiyê nasîn. Bi hatina roja çalakiyê, me tevan xwe amade kir û bi êvarê re em bi rê ketin. Her çar tabûr ne li ba hev bûn. Tabura me ku li serê Çiyayê Metîna bi rê ket, wê li nêzî Bamernê bi gihişta hevalên din. Di wê rojê de me soz ji Metîna re dabû ku, tola wan pênc hevalan li erdê namîne. Her ku em dimeşin,

118

ronahiya bajar a Bamernê mîna xelekan diyar dibûn. Me soz dabû! Ger ew bajar tev bibe leşkerên şer li pêş me em venedigeriyan. Di rojek mîna wê rojê de şehîdbûn, mîna xelatekî pîroz bû. Şehîdbûn, mîna peyvên Mihemet Şêxo bû:

Ber dilê min pir şêrîn e
Wek kulîlka bi hilm û bêhn e
Dilê min bûye bi evîn e
Wez bi evîna te nikarim
Hela were şêrînê
Derman bike birînê!

Belê, pênc heval di dilê min de bibûn birîn. Şehîdbûn jî derman bû ji bo me. Bi rêya wê, me wê bar bikira cihana wan hevalan. Her gavekî hêrsa me zêdetir dikir. Êdî tevahî xeyalên me bibû çalakî û serkeftin bi dest xistin. Em bi wê hêrs û ponijîna xwe, yek bi yek derbasî cihê xwe yê diyar kirî bûn.

Wê gavê saet çarê sibehê bû. Em tev mîna xirîstiyanên ku di roja yekşêmê de li benda zengilê dêrê bin, wisa li benda dengê doçkayê bûn ku me yê bi wê dest bi çalakiyê bikira. Her yek û bi taybet ez, di nava ramanekî kûr de bûn. Mîna her carê me xwe ji her tiştî re amade kiribû. Bêdengiya wê sibehê, tenê bi dengê dîkan dihate dagirtin. Perda wê bêdengiyê, bi terqêniya doçqayê parçe bû. Dengê wê dihate wateya dest pê kirina çalakiya dîrokî. Deng fermana tolhildanê da. Êdî ji her hêlî ve, mîna taviyekî biharê, gule ber bi bajar ve çûn. Hêdî hêdî grubên êrîşê diketin nava kolanên bajar de. Şer bû şerê bajaran. Piraniya pêşmêrgeyan xwe di nava qeleya nav bajar de veşartin. Me piraniya hêza xwe da li ser qelê.

Gruba ku heval Hesen serkêşî jê re dikir, di sirên pêş ên êrîşê de bû. Gava ku wan di kolanekî de şer dikir, ji nişka ve, gule ji paş ve li ser wan de barîn. Li wir heval Hesen birîndar ket. Hevalên li ba wî, bi tevahî fedakariya xwe ew hilgirtin û li deverekî bi ewle veşartin. Heval Hesen her çendî li ser grubê radiwesta jî, mirov ji dilnizmiya wî hîs nedikir ku ko-

mitan e. Ji hêlekî ve hevalê hevalên xwe bû, ji hêla din ve

komitanekî fedekar bû. Wî li her deverî rola xwe a şoreşgerî bi cih danî. Ew di nava şoreşê de pijiya bû. Tevî ku ew çend sal bû li çiya bû jî, mîna vê carê bi giranî birîndar nebibû. Şûna ku jê birîndar bibû, xwîn jê nehat. Wate xwîna birînê bê ku derkeve, di nava hinavan de dima. Mixabin hîna bijîşk negihiştî ser, li wir, li şûna çalakiyê şehîd dikeve. Berî ku heval Hesen xatirên xwe bixwaze, tenê çend gotinên mîna xunafê li ser pelan ji ser lêvên wî daketin:

-Min tim û tim şehîdbûn, dixwast. Lê îro û di vê kêliyê de ez pir hêrs bû me. Şehîdbûnê naxwazim! Ji ber ku xwîna min tevlî vê xakê nebû! Her di hundirê min de ma! Hevalno silavên min ji tevahî hevalan re hene.

Erê! Mixabin heval Hesen bêyî ku hesreta dilê xwe bi cî bîne, bar kir. Wî tim dixwest ku bi xwîna xwe vê xakê bineqişîne. Lê ew xwestek bi mayîna xwînê di cerg û hinavên wî de, bi cih nebû. Wî tim wisa bawer dikir ku; “ax hêza xwe ji xwînê digire” lê xwîna wî bê ku biherike ser axê, li ba wî ma.

Çalakî bi serkeftî û bi encamên ku me dixwest bi dawî bû. Lê heya em gihiştin şûna xwe jî, hîna kesî ji yekîneyê, bi bûyera heval Hesen nedizanî. Tenê xebera rêvebiriyê ji vê yekê hebû. Tevî wê yekê jî, me di rê de tiştek ji meşa xwe kêm didît. Lê ma, me yê kengê bawer bikira ku heval Hesen kêm e?!.

Ya rast me nedixwest ku em bawer bikin jî, her yekî hîs dikir ku ew şehît ketiye. Lê kesî jî nedixwest qal bike. Dema ez vê gotinê dibêjim jî, belkî ne li gora zagonên şer e: “Ez bawer nakim!” Lê ev rasteqîna şer bû. Girî li hember

heskirina hevaltiya rasteqîn mîna dilopek ji ava çemê Firatê ye. Tevahî şehîdbûn bi wate ne. Lê şêweyê şehîdbûna hevalê Hesen mîna birîna wî di dilê min de bêderman e.
Vegotin: Zelal Gûyî
120

PEPÛLEYA ÇAREMÎN
“Lê mixabin pepûleya çaremîn dereng mabû, ew hingî gihişte şuna hersê hevalên xwe, gava wan barkiribû cîhaneke din.”
Demsala havînê, meha Tirmehê bû. Gerîlayên welatê agir û rojê xaka qehweyî a bii berhem di qelişandin. Sê cotling dimeşiyan. Bi hêcan û lez bûn. Ji gelek hêlan ve awirên îxanetê ew dişopandin. Pişt re xakên me tên avêtin. Rengê qehweyî vediguhêze rengê sor!
Sê rêheval! Sê mirovên dûrî welatê xwe. Dûr ji xaka xwe dijiyan. Songul, Seygul û Serdar! Hersêyan navê welatê xwe û li ser xaka xwe jiyankirin kiribûn armanc. Berê agir, êş, şer û mirin nas nedikirin. Pişt re wan bihîst ku pir dûrî cihê ew lê dijîn, welatek heye. Navê wî welatî, welatê rojê ye! Welatê ku weke parçeyeke ji bihuştê ye. Başe! Lê gelo kî bûn ên li ser vê xakê? Zarokê agir kî bûn? Tişteke çawa ye ku mirov ji agir be? Wan meraq kir û ji dayîka xwe ya dîrok ew pirsana pirsîn. Wan sir û nehêniya pirsa xwe; “çawa mirov ji agire” nezanîn û nenasîn. Lê dayîka dîrok, çîrok ji wan re, vegot;
-Her çar pirpirîk, lehengvanê sira agirin! Wan biryar da ku rastiya vê yekê bizanin. Pirpirîka yekemîn li dora agir digere û dibêje:

-Agir ew e ku ronahiyê dide.
Pirpirîka duyemîn, hinekî nêzî agir bû û got:
-Agir ew e ku germahiyê dide.
121

Pirpirîka sêyemîn piştî ku nêzî agir dibe û alevên agir pe-
rê wê dişewitîne, dibêje:
-Agir ewe ku dişewitîne.
Lê tu kesî ji wan negihişt sira (nehêniya) agir. Lê,
pirpirîka çarem bi van namîne, lii dora agir digere, wisa
dizivire ku heya dişewite, di nava pêtên agir de winda dibe û
diçe jiyana bêveger! Ew bi tenê gihişte nehêniya agir, lê...
Piştî li çîrokê guhdar kirin, pirpirîka çaremîn bandorek
mezin li ser hersêyan kir. Wan êdî biryar dan ku ji vir û şûn
ve nehêniya agir ji hev derxin û mîna pirpirîka çaremîn bijîn.
Songul keçeke kurd bû. Ew bedew bû. Hesdikir û dihate
heskirin, dikeniya û dida kenandin. Ew li Anadoliya
hundirîn, hatibû dinê.
Saygul û Serdar xwişk û bira bûn. Li Erzîncanê ji
dayîkbûne, lê mixabin wan Erzincan nedîtine û her tim li
Stenbolê jiyane. Saygul keçeke kurd ya mêrxas, zana û
dilsoz e. Serdar jî, ciwanekî kurd e, bi înat, jîr û bi mereqa
milîtaniyê ve tijî ye. Her sê jî, xwendevanên zanîngehê ne. Li
wir hev dinasin, bûnê heval û Hogir. Li wir jî, têkoşîn
naskirine. Li wir dest bi legerîna nasîna sira welatê roj û agir
kirine. Wê demê, gava dihate xwestin, roja wan tarî bibe,
wan fêmkir ku dema rêwitiya ber bi rojê ve hatiye. Dema ku
biryar dan, çar kes bûn. Gava kincên xwe yê bi yek rengî

girtin, êdî dema çûnê hatibû. Mixabin tenê sê kesan dikaribû vê carê herin. Ji ber vê yekê, yek ji wan dima. Ew ê biçûnan welatê agir. Wê çiya bi çiya, zozan bi zozan, çem bi çem bigeriyana. Berî ji hev qutbûnê, Songul got;
-Em diçin meskenê pirpirîka. Ji bo derxistina sira agir, em diçin bibin pirpirîk, em ê li benda te bin heval!
Ew 24 katjimêran li paytexta welatê xwe, li Amedê man.
Ew cara yekem bû ku ewqas nêzî welatê xwe dibûn. Wan her sêyan şadî û bextewariya vê rojê parve dikirin. Yekem karê gerîla ew bû ku, ji wan re nav bibînin. Lê wan nav ji berê ve amade kiribûn. Her sêyan jî, ew navên diyarkirî pejirandin. "Arjîn, Berfîn û Şervan." Ji bo wan her sêyan êdî jiyanek nû
122

dest pê dikir. Ew her sê jî, mîna hev bi coş bûn. Hîn ew negihiştibûn biryargehê nûçeya wan li wir jî belav bibû û herkes bi meraq çav li rê bû. Jixwe tevlîbûna herdû xwişk û bira, bandor li ser her kesî kiribû.
Wan her tiştê nû, meraq dikirin. Şal û şapik, bombe û rext, kefî û bi taybet jî jiyana gerîlayan mîna xewnekî bû ji bo wan. Niha jî, ew xewin pêk tê.
Ji hatina wan, hefteyek pir zû derbas bû. Ew her roj di deverekî cûda re derbas dibûn. Roja dawî jî, berî ku rêwitiya meşa xwe bidomînin, her sêyan bi hev re şal û şapikên xwe, wêne kişandin. Ew ê êdî biçûna şûna ku heval lê diman. Lê, di şeva heftan de, piştî wêne kişandinê, her sê jî xemgîn bûn û di rê de bêdeng dimeşiyan. Her sê jî, li ser negihiştina hevalê xwe yê çarem difikirîn. Hevalan ji her sê yan re

gotibûn;
“Bi lez bimeşin.”
Ew tu deman bi kemînên xayîn nedifikirîn. Rastiya bi qirêj a deshilatên li ser welatê rojê, qet neketibû xeyalên wan. Hîn wan meş didomand, ji nişkê ve fîşek teqiya! Dengê teqînê bilind û zêde bû! Lê dema li hev nêrîn, pir şa bûn, Ji ber ku hîn li cem hev bûn. Bibûn yek laş, yek dil û yek hizir. Niha di vê kêliya zor de her sê jî, pirpirîka çaremîn di dilê xwe de hîs dikin. Şervan bi wê hestiyariyê got;
-Heft roj û heft şev derbas bûn?
Berfîn;
-Em ê sira agir ji hev derxin”
Arjîn, di dawiyê de got;
Pirpirîka çaremîn!!
Lê, mixabin pirpirîka çaremîn dereng mabû. Ew hingê gihişte şûna her sê hevalên xwe, gava wan barkiribûn cihaneke din. Wan tenê heft şev û heft rojên bihara temenê xwe jiyan kirin. Her heft roj û şev jî, bi lêgerîna sira agir derbas kirin. Di dawî de jî gihiştin! Ew hersê bûne pakrewanên agir û riya rêhevalên xwe ronî kirin.
123

Vegotin: Zerdeşt Dîlok
WÎ BAŞTİR DİDÎT
“Ev deh sal bû ku bala xwe li çivîkan ne xistibû, ne jî bala wî kişandibû. Lê niha bi dengê xwe jiyan dida wî, hêza dîtinê dida wî.”
Nizanîbû korbûn çi ye?

Ew deh sal bûn şer dikir.
Biyaniyê jiyana tarî bû, jiyana veşartî, jiyana bi tenê!
Têra xwe temaşeyî çiyan dikir. Teht û zinarên tûj, gilover û renga reng. Di şevên tarî de, berê xwe dida stêrkên ku asîman dixemilandin. Li ser dengê hevalên xwe çavên xwe vedikir. Diçû şûna pêwaniyê û li ezman temaşe dikir. Demên dirêj bi meyzekirina asoyê sor derbas dikir. Ew çax hêviya rojeke nû di dilê wî de aj dida. Bi coşî dikeniya, diponijî û rojên şerê giran dijiya.
Tevahî dol, gelî, berpal, kevî, kendal û zinarên çiyayên welatê xwe didît û lê digeriya. Geliyên kûr ên Amedê, teht û zinarên Dêrsimê, deşt û zozanên Agirî, gir û firekeyên Çiyayê Çolemerg û Şemzînanê, daristanên Botanê û di dawî de jî, dol gir û darên Qendîlê dîtibûn. Li ser lûtkeya çiyayên welatê xwe temaşeyî bajarên welat dikir û dijiya! Rengê tevahî kulîlkên çiya dîtibû. Tevahî di dil û majiyê xwe de hilgirtibû.
124

Ma kêm caran kerengên Çiyayê Gever û Gabarê di beroşa çelexwehrî de sor kiribûn? Ma kêm caran tolika ber palên Bagokê kom kiribû?
Wî pir dabû hev û dijiya! Dîtibûn!
Deştên Batman, Bismil, Sêrt, Mûş, Gever û di dawî de jî deştên Qendîlê dîtibû. Ne tenê ew ger di wêne de be jî, wî Serokatî jî dîtibû. Bi hevî û baweriya wî dijiya. Wî tim dixwest berî ku şehîd bikeve û hîna tu bela nehatin serê wî, Serokatiyê bibîne.

Lê mixabin wî nedît û hêviya dîtinê jî winda dibû! Serok li İmralî, ew jî li Qendîl.
Ew bi hêviya dîtina başûrê welat hatibû Qendîlê. Lê hîna salekê wî tijî nebibû, şer derket. Xayînan êrîşî ser sengerên hevalan kirin û şer dest pê kir.
Di şevekê hişkesayî de, êrîş çêbû. Bi zext û zoran bandora tolhildana hevalên xwe yê şehîdketî, êrîş dikirin. Bi rik û hêrsa li dijî xwînmijî û xayîntiyê, şer dikirin. Bi hêviya gihiştina rojên aram, rojên dildarên azad, rojên gihiştina hestên roja nû, rojên rûxandina diwarên ewantiyê, şer û têkoşîn dikirin.
Ew jî, li kêleka rêhevalên xwe, li ser sînorê mirinê dijiya û dimeşiya. Di dema êrîşkina ser hêzên xiyanetkar de, narîncoka ku hevalê wî davêje, li ber wî dikeve û diteqe. Çirûskên narîncokê, li wî belav dibe. Weke ku deng ji dilê wî derkeve, xwe avêtibû erdê. Tenê herdu destên xwe danîbû ber çavên xwe!
Çavên wî şil bibû. Lê ne ji rundikan, ji xwîna gerim bû! Piyên di meqeba reş de gerim bibûn. Bê ku wisa bisekine, hêdîka di cihê xwe de rûnişt. Hew dikarî êrîşê bidomîn e. Di serî de wî jî nizanibû bê çibû ye. Hevalên wî jî tu tişt nedîtin. Bi germbûn êrîş didomandin.
Ew jî li ber pala Qendîlê, li ser girekî rût û tazî runiştibû. Li ser deşta Singeserê re bû. Li dijberî hêzên xiyanet bû. Êdî roniya heyvê jî nedidît. Rengê gul û hevalên xwe êdî nedidît.
125

Hevalên wî paş çalakiyê ew anîn şûna hevalan. Berî ku

wî bibin nexweşxanê; dixwest ku çemê Zelê, Qeletûkan û Dûkan bibînê, lê nikaribû...
Hertim bibû şev ji bo wî, weke dema razayî. Wî nizanibû bê bigrî an jî bikene. Tenê axînan şûna her tiştî girtibûn. Sala 2000 î mîna şevekî reş derbas bû. Gelek zarokan çav ji ronahiya dinê re vekirin. Gelek gulan rûdane rojê.
- Lê ez..! Hîna wisa me…..
……Min hîn jî gelek deverên welatê xwe nedîtiye. Ma dîtina Silêmanî; Hewlêr, Qamişlo, Efrîn, Mihabat û Sinê wê bimîne xewna tevahî temenê min? Hîn min tevahî deşt, gelî û zozanên welatê xwe nedîtibû. Min hîn jî gelek hevalên xwe nedîtibû, min hîn jî Serokê xwe nedîtibû.
Wê demê dengê awaza çivîkekî li ber guhê wî ket.
-Çi dengekî xweş e, lê çawa ye? Ma rengê wê reş e an sipî? Kesk e an jî belek e? Lê çawa be bila bibe, deng xweş e!
Ew deh sal bûn ku bala xwe li çivîkan nexistibû, ne jî bala wî kişandibû. Lê niha bii dengê xwe jiyan dida wî, hêza dîtinê dida wî. Wê kêliyê xweza bi dengê xwe temaşe yê wî dikir. Niha jî hêviyekî bêsînor dida wî û dilê wî dadigirt.
-Ma ez nabînim! Bi çavê kor be jî mirov ji gelek kesî zêdetir dibînim!
Hingî dibû hîn zêdetir zirav û dil şad dibû. Wî êdî ronahiya tavê di hundirê xwe de hîs dikir. Bêhna werzê bihara ku mirov salê carekî didît, wî tim hîs dikir. Azara dilê evîndaran, êşa dilê dayîkan di dilê xwe de hîs dikir. Ew çax wêneyê Serokatî bi çavên bêronahî didît! Ji her demî zêdetir hestên girêdana bi Serokatî yê re di dilê xwe de hîs dikir.

Xwe li İmrallî dizanî. Zerdexaneyek ket ser lêv û rûçikên wî. Serê xwe rakir. Çavên wî girêdayî bû. Lê tevahî deşt, aso û xweza didît.
-Ez bi hîskirina xwe her tiştî dibînim. Tiştên ku mirov bi çavan jî nabîne, ez dibînim!
Bi hêvî bû, didît!
126

Vegotin :Hejar
BERFA SOR
"Şevek tarî…Mij û dûman Ji her alî berf û baran Ne hîlal û ne estêra Li ser guzê kundekî dixwend Gilokê berfa sor Xwe alandin li hevala Bêdeng kirin, Bêreng kirin, Xortê hêja Û dilovan"
Xweza gelek caran bûye sedema êşên mezin, gelek caran jî bi xweşikbûna xwe di tevahî cihanê de bi nav û deng e. Xweza ya Mezopotamya ya Yezdanî, bi hesanî nayê behskirin û taswîrkirin. Ew gelek caran bû helbest li ser zarê helbestvana, gelek caran jî bû sitran û awaza hûnermenda , lê heya roja îro jî tu tiştî nikariye vê xwezaya pîroz ya ku serdemê Kurd li ser dijin, bi tevahî bînin ziman. Ev xweza ne bi tenê bi bedewbûna xwe navdar e, ew bi dîroka xwe jî xwedî şûnekî herî taybet e di dinyayê de. Lê bi sedema şer û pevçûnên ku heya sedsala bîstan dirêj kir û hîn jî dirêj dike, gelek şûn û cihên wê yê dîrokî, bûne kûrbana şerê lawê mirov.
Di Têkoşîna Rizgariya Netewî de jî, xwezayê Kurdistan du rolên serekî leyîstiye. A yekem, gelek caran xweza bûye

şûneke pir bi ewle ji bo cengewarên (gerîlayên) Kurd. A duyemîn jî, bi sedan û bi hezaran gerîla bi sedema mercên
127

zor û zehmet ên zivistanê şehît ketine. Berfê ku li çiyayên vî welatî dibare ewqas pir e bi metiran berf li ser hev kom dibe. Gelek dever li Kurdistan hene ku, ji ber ku berf lê nahele çiyayên ji berfê çêbûne. Li gelek, deveran jî, çemê avê di bin berfê de dimînin û berf dibe mîna piran li ser rûbaran û gerîla jî mîna rêyan bi kar tînin. Gerîlayên Parastina Gelê Kurd jî, ji bo xwe ji zehmetiya zivistanê biparêzin, hîn di havînê de amadekariyên zivistanê dikin. Ji hêlekî ve şûnên ku lê dimî-nin ava dikin. Ji hêla din ve ji ber ku di zivistanê de gera gerîla kêm e, amadekariyên ji bo xwe perwerde kirinê tê ki-rin.
Sal 2001 li herêma Soran, Çiyayê Qendîl, meh meha Sibatê bû. Ev meh di nava kurdan de mîna meha dînik tê nasîn. Car caran reqe-reqa ewran e. Carna roj serê keçelan wisa dişewitîne ku mirov dibêje qey bûye havîn. Carna jî toviyên baranê cihokên avê diherikîne. Lê Sibata 2001 ê, ne mîna tu sala bû. Di wê mehê de takêşên (dengê) yê xwezayê serobino bibûn. Dola Kokê ku xeta di navbera başûr û rojhilat a Kurdistanê de ye, wate sînorê di navbera herdu perçayan de ye, bi zozanên xwe yê tazî ku ji goniya pê ve tu tişt lê nîne, tê nasîn. Tenê li qiraxê çemê Dola Kokê de dar şîn dibin. Ev der jî bi piranî cihên gûz, giwîj, hinar, kizwan û çinara ne. Li Qendîlê deverên herî zêde berf lê dibarin yek jî Dola Kokê ye. Ev demek dirêj bû ku heval Çekdar, Ednan,

Xelîl, Sîpan, Dana, Sîlwan û hijmarêk din ji hevalan bi hev re li Dola Kokê diman. Wan cihê xwe yê perwerdê li jêr, wate di dolê de çêkiribûn. Her yekî ji wan hevalan, bi salan di çiyan de mabûn û bibûn xwedî tecrûbeyên mezin. Hevaltiya di nava wan de bêhempa bû. Heval Çekdar ji A-madê bû. Ew bi salan bû mîna bazekî, çiya ji xwe re kiribû hêlîn. Kesayetiya wî a şoreşvanî mîna hevîrekî, di tişta zor, zehmetî û rojên giran a şer de hatibû sitirandin û gihiştin. Ew gelek caran di şer de birîndar bibû, cara dawî jî ji serê xwe bi parçek mezin birîndar dibe. Lê wî xebata xwe ya bêsekin û bêhnvedan nedihişt ku kes bizane ku ew birîndar e. Ya rast

128

wî bi tevgera xwe û kena lêvên di simbêlan de, şerekî herî mezin bi bîrana xwe re dikir.
Hevalê Sîpan ji Hewlêrê bû. Dengê wî dema dihat gohên mirov te digot qey "şehîd Serhed li ser Hewlêr dilorî ne."
Hewlêr qêrîna zarokan
Hewlêr lorîka dayîkan
Hewlêr kilê çavên bûkan
Hewlêr bi xwîna şehîdan....
Ew deng mîna lorînekî bi êş dihate gohên mirov. Ne tenê ev, heval Sîpan di karkirina xwe de jî bêsekin bû. Ger mirov li navekî din ê Sîpan bigere, mirovê navê "karkir" bibîne. Heval Delîl jî ji Qamişlo bû. Wî bi salan di nava gelê welatparêz de xebat kiribû. Wî civaniya xwe di nava partiyê de derbas kiribû. Dema li Dola Kokê dima, êdî bi kopal dimeşiya. Tevî nexweşî û temen mezin bûnê jî, wî coşî

dixiste dilê her hevalekî kêleka xwe de.
Ev hersê heval mînaka wê yekêneyê bûn. Ew yekîne mîna guldanekî lê hatibû. Her hevalekî jî mîna gulekî cihê xwe di gûldanê de çêkiribû.
Belê, meha 20 Sibatê 2001 ê bû. Piştî şerê ku di sala 2000 an de li Qendîl qewimî, partiya me PKK xwest ku xebatên rêxistinî di başûr de bi hêz bikin. Heya wê çaxê gelek rastiyên pîroz ji hêla gelê başûr ve, berovajî dihatin nasîn. Ji bo ku rastî naskirina armancên têkoşîna partiyê ye, di vê demê de li Dola Kokê konferansek dihat lidar xistin. Ji ber vê yekê partî gelek hevalên ku di nava gel de diman, vexwendin vê konferansê di nava wan hevalan de gelek hevalên başurî jî mînak heval Arî, Pola û hwd, gelek hevalên din hebûn. Her di wan rojan de berfeke bêeman dibariya. Pê-şî berfê sipî her dever pêça. Paşî te digot qey, herî dibare wisa berfek rengê xwe sor dibariya. Darên guza ên Dola Kokê mîna pîrekî pişt qof, di bin berfê de xwar bibûn.
Şûna ku em lê diman, nêzî cihê wan hevalan bû. Ew çend roj bû ku heval Pola, ji bo çûna konferansê li ba me disekinî. Heya roja ku çû jî, hevalên li kêleka xwe keyfxweş û dil aş
129

dikir. Roja ku ew çû, hîna konferansê dest pê nekiribû. Lê ji bo amadekirin şûna ku konferans lê dihate dest pê kirin, tev di wê berfê de dixebitîn. Roja 23 ê Sibatê dema ew ji şûna xebatê vedigeriyan, hevalê Arî û Pola diçin serdana heval Çekdar, Sîpan û hevalên din. Roj hîna neçûbû ava. Van piştî li rewşa hev pirsîne, dest bi gotina serpêhatiyên xwe ên

rabûrdu kirin. Dengê qundê ku li ser dara guzê diwen, dihate nava civata wan, ev bala herkesî kişandibû. Bi taybet di vê mehê de ku mitreyek û nîv berf bariya bû, xwendina qund ji bo herkesî nîşana xeberekî nexweş bû. Xwendina qundan di nava gelê me tê wateya bê siudî û malxirabbûnê! Lewra di zanyarî de jî ev gotin wateyekî xwe yê zanistî jî heye. Qund heywanekî pir hessas e û berî ku di xwezayê de an jî di cihê ku ew dimîne de bûyerekî biqewime ew hîs dike. Ji ber vê yekê jî bi berî bûyerê ew bi dengê xwe agahî dide derdorê xwe. Gerîla ku bi xwezayê re ewqas bûye hevkar, helbet hemû heywanê xwezayê jî dinase û wateyekî dide hemû helwestên heywanan…Xwendina qudê ji ber vê yekê nexweşiyekî di nav hemû hevalan de aj da.
Tevî ku bêr ji destê hevalan nediketin, lê bi hatina evarê re, barîna berfê zêdetir dibû. Deverên ku dihat paqij kirin, piştî çend deqan wek berê lê dihat. Berfa ku dibariya nebes bû, bahozê jî, ji girên jora me berf li dola ku em lê diman kom dikir. Wê şevê heya dema razanê me sê caran berf li ser mangên xwe avêt in. Lê bêfeyde bû. Berfa ku dibariya û a bi bahozê re li ba me kom dibû, tirsa hatina aşûtê di dilan de zêdetir dikir. Wê şevê kes ji me raneza. Ya rast cesareta xew kirinê li ba kesî ji me, nemabû. Her bihnekî hevalek an didu, dibû erikdarê avêtina berfê. Ê ku ji derve dihate hundir, te digot qey bi rengê sor hatiye mekyaj kirin. Poz, lêv û rûçik ji serman sor dibûn. Jixwe sobeya me a ku li ser darên berfê dihate gerim kirin, di wê şevê de rola xwe zêdetir dibû. Mîna zarokên ku di wê şevan de li dora pîrika xwe rûdinin û li çîrokan guhdarî dikin. Em li dora sobê kom bibûn. Ew rewşa

me heya katjimêr 1:15 deqe dirêj kir. Wê kêliyê dengê
130

xumêniyek hat. Pêşî me nizanibû çi qewimî. Lê hîna kêliyek di wê navê re derbas nebibû, dengê hawarekî hat. Hingê diçû hewar nêzikê me dibû. Me ji deng zanî ku yê qîr dike û alîkariyê dixwaze, heval Kanî yê Kubanê bû. Dema em derketin derve û ber bi wî ve çûn, me ji nû baş jê fêm kir bê çi bûye. Qêrîn û girî li ser heval Kanî tevlî hev bibû. Tenê gotinek digot:
-Hevalan xilas bikin. Heval di bin berfê de man!
Heval Kanî ji serman re direcifî. Me ji wî zanî ku, manga heval Çekdar, Sîpan, Xelîl Ednan ku heval Arî û Pola jî mêvanê wan bûn, di bin aşûtê de man e. Pêşî kesî nedixwest ku bawer bike. Tevahî hevalên li Dola Kokê diman ji xelaskirina wan hevalan li wir kom bibûn. Bi çirayên destê xwe, em li şûna hevalan digeriyan. Mixabin te digot qey mirov di vê de rê de derbas nebûne. Berfê her dever bin xwe de rast kiribû. Ewqas bi lez û zêde aşût ketibû, darên guzan ku temenê wan ji 100 salî zêdetir bûn, ji kokê anî bûn der û bi ser manga wan hevalan de ketibûn. Hevalên ku ji bo rizgarkirinê kom bibûn, di cî de dest bi avêtina berf û daran kirin. Tilofên berfê nerim, di wê serma û bayê de mîna derziyan li rûyê hevalan ku xebatê rizgarkirinê dikirin, diket. Wê şevê bêrên li wir rane-diwestiyan. Bêr ji destek qerisî diçû destekê din. Kesî ji me li ê din nedipirsî, her kesî bi dil û can xebat dikir. Herkes bi hêviya xilas kirinê wan hevalan li wir diman. Rondikên hevalên bi êşa wê şeva bêbext re, bi

ser şûna wan hevalan de diketin. Heya berê sibehê xebata rizgarkirinê berdewam kir. Hêdî hêdî laşê hevalan di nava berfê de diyar kirin. Keyfxweşiyê rûyê hevalan rapêçand. Mixabin keyfxweşî zêde dirêj nekir, bi derxistina hevalên destpêkê, hêviya kesî nema ku kes di bin berfê de sax mabe. Hîna xebat didomiya dengek ji koşeya milê rastê hat. Hevalên ku bi bêran kar dikirin, di cî de û bi lê ew devera ku deng jê dihat kolan. Piştî kêliyekî heval Sîlwan Efrîn û hindirîn ku di bin berfê de ew sax mabûn, hatin derxistin. Wê şevê herdu heval ji rengê mirovan derketibûn. Rûçikên wan
131

tev reş û şîn bibûn. Çavên wan werimîbûn. Tenê şensê wan ew bû ku, gava aşût tê, darek li ser cihên wan disekine û nahêle berf bi ser wan de zêde here. Li ser destê hevala Sîlwan nivîsek hebû. Ev nivîs silav û gotinên dawî ên wan hevalê di bin berfê de mabûn bûn. Berî ku ew heval şehît bikevin, silavên xwe ji Serokatî û hevalan re rê dikin. Heval Sîlwan jî ji ber ku nikariye defterê derîne, her tişt li ser mil û destê xwe nivîsandibû. Tevahî wesiyet û gotin di kêliyekî de li ser wî destê kom bibûn. Lê mixabin di hatina sibehê re û piştî ku xebatê rizgarkirinê bi dawî bû, me xwediyê wan gotinan bi laşê bêgiyan dîtin. Sîpan Hewlêr, Çekdar Amed, Arî Hewlêr, Delîl Qamişlo, Dana Sileymanî, Rêber Kerkûk, Pola Hewlêr, Xelîl Urfa, Ednan Qamişlo, Welat û Mîrxan bûne yazdeh berfînên Sibatê. Ew bûne yazdeh pepûleyên nû di nava artêşa pepûleyên pakrewanan de, bûne yazdeh stêr-kên ji ezman rijiyayî. Lê ezmanê di dilê me de bi cî bûyî.

Cenaze yê her yazdeh hevalên şehîd li Dola Kokê nêzî şûna mayîna wan hatin veşartin û ew der wekî goristanê şehît hate beyan kirin. Ew êdî dibûn awaz û helbestên ser zarê hûnermendan êdî hûnermend Delîl Mîrsaz li ser wan dilorand;

“Şevek tarî...Mij û dûman
Ji her alî berf û baran
Ne hîlal û ne estêr e
Li ser gûzê kundekî dixwend
Gilokê berfa sor,
Xwe alandin li hevala
Bêdeng kirin,
Bêreng kirin,
Xortên hêja û dilovan
Berfa reş a tawanbar
Tê çawa bersiv bidî,
Van rondikên ku çavên
Dayîkan tenê xwar
Tu yê çi bibêjî,
132

Wan hevalan ku ,
Dilê wan di qefesa singa wan de
Hilnayê
Tu yê çawa serê xwe hildî,
Li hember peytaxta welatê min?
Bajarê qele û minareya
“Holaka ya bi zêr

Goristanê bavê felek,
Li bajarê evînê.
Tu yê çawa bidî razî kirin
Van çîçekên ku ,
Rengê Ednan, Çekdar û Xelîl didin
Bêje berfa reşa tawanbar
Bêje,
Bêje,
Bêje!
Dilê Amedê dilerizî
Qamişlokê dil helandin
Ji hawara dengê Hewlêr
Silêmanî çav gerandin,
Dana,
Arî,
Sîpan,
Pola,
Çava digerînin,
We nebînim.
Li ber kelehê bendewarê we me.
Ji bo tu xwe bidî lêbûrandin,
Ji bo tu rondikên Kurdistanê min bidî
Rawestandin.
Ji bo yazdeh xûçeyên di gulîstana,
Welatê min de careke din
Bi bişkivin û bi bihizîn,
Divê tu dariv î berfa sora bêwîjdan
133

Divê tu darivî
Ji şikêr û quntarê Qendîl
Divê xwe tu berdî nava,
Bax û baxatên,
Şeqlewa,
Kerkûk
û Rûha yê.
Gul û gulzaran avdî
Bibî xunavêk,
Bi herikî bibî sûlavek.
Bila dengê xuşxuşa te,
Bibê orkestraya evînê,
Û di dilê xort û keçê welatê min de bijene
Bijene berfa sora malwêran
Bijene-bijene.
Doxan Xezna
134

RASTİYEK Jİ AWİRAN DÛR
“Êdî ew zarok bibûn desthilatdarên xeyalên min. Eger ez bibêjim; ‘min wê çaxê Helepçe û Filîstînekî nû dît wê neşaş be.”
Ew du sal bû ku ez li nava çiyayên bilind û bi heybet ên Qendîlê de bûm. Bi sala bû ku min navê Qendîlê bihîstibû. Bi taybet jî, di dîroka Têkoşîna Rizgariya Netew a Kurd de, Çiyayê Qendîlê mîna dayîka ku zarokê xwe hembêz dike, wisa têkoşer û peşmergeyên kurdan hembêz û parastibûn.

Heya niha jî li ber her çemekî, latekî, berpal û girekê Qendîlê, bêguman yan şehîdekê Kurd heye, yan jî şûna şerekî, diyar dibe. Dema navên Çiyayên Qendîlê têne bîra mirov, ev rastî pir zelal xuya dibe. Mînaka herî zindî jî, navê Çiyayê Qeletûka, Kanî Cengê û hwd. Ev herdu nav bes in ku mirov wateya Qendîlê a dîrokî binase. Belê piştî salên dirêj, êdî gerîlayên kurd li Qendîlê bi cî bibûn.
Dema ku cara yekem ez gihiştim refên gerîla, li Çiyayê Qendîl bûm. Hevalên min ên pêşî jî, min li Qendîlê nasîn. Ew çiyayê ku heya meha Temmûz û Tebaxê berf li lûtkeya wî dimîne, mîna dayîkekî bû ji bo me. Dayîk tevî ku gelek caran li zarokên xwe jî dixe, dîsa jî zarok pir pê ve girêdayî
135

dimîne. Tevî zor û zehmetiyên Qendîl jî, dîsa me pir jê hesdikir. Ji hêlek din ve, Qendîl gelek caran mîna dildaran bêxwezginî keçek kezî reş yan jî xortekî çavgeş ji me dûr dixist. Dûrxistineke bêveger! Ew keç û xort, rêhevalên me yên salan bûn. Bi çûyîna her yekî ji wan, girêdana me bi deşt û zozanên Qendîl re hîn bêhtir xurt dibû.
Qendîl ne tenê bi navê xwe navdar e, ew bi deşt û zozan, daristan, kanî, rûbar û keskahiya biharên xwe, mîna bihûşta ferdewsê, tim diyar e. Di dirêjahiya biharê de, zozanên Qendîlê ji reşmalên koçeran tê xemilandin. Mirov li wir bi dengê bilûra şivanan û sitranên berîvanan re xêrhatina biharê dike. Li Qendîlê pêwîst nake ku mirov mîna li bajaran gul û nêrgizan ji bo bêdewiyê biçîne. Bihar bi hatina xwe, tevahî Qendîlê mîna gulîstanekî xwedî her rengê gulan dixemilîne.

Belê du salan li kêleka heval û hogirên xwe, min di nava vê xwezaya yekta de jiyan kir. Piştî wê dema dirêj ji bo tevlîbûna perwerdeya li ser çapemeniyê, pêwîst hate dîtin ku em ji Qendîlê cuda bibin û biçin Xinêre. Min qet bawer nedikir ku ezê rojekî ji Qendîlê cuda bibim. Lê gava min xebera çûnê bihîst, du sal mîna du kêliyan di ber çavê min re derbas bûn. Tevî ku min du salên li Qendilê mîna du pirtûkên çapkirî di pirtûkxana dilê xwe dihiland jî, lê wê xeberê bandoreke mezin ya xemginiyê li ser min kir. Bi wê xeberê re, navê Xinêre ku em rêwiyê rêya wê bûn, mîna dengekî li gûhê min de deng vedida. Êdî her ku kêlî diçûn, rûpelek bi navê Qendîl dihate pêçan û yek bi navê Xinêre vedibû.
Roj 25 îlona 2001 ê, saet yek û nivê pişt nîvro. Piştî amadekariyên du rojan, me xuçikên rêwitiyê datanî ser milan. Piştî xatirxwestina ji rêhevalên du salan, bi xemginiya qûtbûyînê, em ketin ser rêya Xinêre. Li gel hevalên xwe "Tapo, Kawa, Herjîn û Cihan" em ji Radyo ya Dengê Gerîla bi rê ketin. Li dûv du salan ji mayîna min a li radyoyê, ev ca-ra yekem bû ku ez dibûme koçerê rêyek wisa. Hevalan berî
136

derketina me, gotibûn ku heya "Xinêre" 6-7 roj meş e. Lê ji ber ku di rê de heval pir in, hûn zêde zehmetiyê nakişînin. Jixwe di wê rojê de xemginî bibû koçerê rûçikên me.
Min wê rojê bîranînê xwe yên du salan xistin binê xurçika xwe. Dema em bi rê ketin, her ku me gavêk davêt, min li paş xwe, li şûna ku radiyo dima dinêrî. Piştî meşa nîv saetî, em

gihiştin girê jora radiyoyê. Ji wir meyzekirina me, cara dawî bû ku me li şûn xwe dinêrî. Tevî kovaniya cudabûnê jî, em bi çûna perwerdê pir dilşa bûn. Ew demek dirêj bû ku, me perwerde nedîtibû. Ji ber vê yekê me bi tevahî daxwaza xwe dixwest ku rojek berî a din, bighên Xinêre. Piştî çend saetên meşê, em gihiştin girê herî bilind ê Şehîd Harûn. Ji ber ku berî niha em li wir diman, min erdnigariya biryargeha Şehîd Harûn baş nas dikir. Hevalê Cihan ku bi temenê xwe ê herî mezin bû di nava me de, tim li paş me dima. Ji ber vê yekê gava em gihiştin serê gir, me navberek da meşa xwe. Wê çaxê roj li ber ava bû. Aso yê sor rengekî bedew dida deşta jêrî me. Hîn me çavên xwe ji meyzekirina wê bedewiyê têr nekiribûn, heval Cihan gihişte me. Heya em ji serê gir derketin dola biryargehê, roj çû ava û hêdî hêdî dinya tarî dibû. Bi tarîtiyê re em gihiştin nêzî çemê dolê. Xûşeniya çem, di dolê de, dengvedida. Ez û heval Tapo, ji ber ku li pêş hersê hevalên din bûn, em li cem çem sekinîn heya hevalên din jî gihiştin. Bi kombûyînê re, em berê xwe dan şûna ku heval lê diman. Hîna em dûrî wan bûn, ji nişka ve dengek hat.

-Ew kîne?..Ew kîne?

Heval Kawa di cî de bersiv da:

-Hevalin heval! Em ji Dola Kokê tên!

Wê çaxê nobedarê ku bangî me kir, ber bi me ve hat û got:

-Hûn bixêrhatin hevalno. Kerembikin.

Piştî bixêrhatin û li rewşa hev pirsîn, hevalan şîv ji me re, amade kirin. Lê ji ber ku em westiya bûn û pêwîst bû ku em

sibehê zû rabin, paş şîv xwarinê, her yekî ji me betaniya xwe
137

girt û raketin. Ji ber westandina rê, em çiqas raketiban me nedigot bes e. Dema dengê hevalan hat jî: “roj baş. Roj baş” min got ku, ev şev çiqas zû derbas bû.
Ji Şehîd Harûn û şûn ve, min tu deverên din neditibû. Ji ber vê yekê, gava em bi rê ketin hevalê Kawa ku rê baş nasdikir, da pêş me. Di bin tava îlonê de, em heya nîvro gihiştin “Qeletûkan” Qeletûkan ku gelek caran min navê wê bihîstibû, sed qet ji tişta ku dihate gotin xweştir bû. Ew dever wisa asê ye, bi sedan heval, di nava zinar û dolên wê de, perwerde didîtin. Bi dehan rengê fekî û meyve di Qeletûkan de her sal berhem dide. Xelkên gundê li Qeletûkan jî, xwedîkirina kûfletê xwe, ji dewlemendiya xaka wir digirin.
Ji ber ku heval li wir nemabûn, em çûne gundekî li ser rê. Ew gund ji dûr ve nediyar bû. Dar û bexçeyên gund her dever kesk kiribû. Heya wê rojê jî, ew du sal bû ku, min gel bi giştî û zarok bi taybetî, wisa nêzik nedîtibûn. Vê dîtinê ez ji her hêlî ve dilşad kirim. Min gelek tişt li ser rewşa gelê me yê başûrê Kurdistan bihîstibû. Lê dîtina zarokên pêxwas, dest terikî, cil qetiyayî û rê gemarî ên vî gundî, ew rastiya ku min bi gotin bihîstibû, hîn bêhtir ji min re ronî û zelal bû. Wê çaxê min hîn bêhtir rastiya rewşa vî gelê perîşan nasî. Zarokên wan jî ne mîna ên dinyayê bûn. Te li rûyê wan meyze bikira, te yê bigota qey ev zarok bêdê û bav in. Lê dê û bavên wan jî hebûn, mixabin halê wan ji ên zarokê wan xirabtir bû. Ew zarok mîna gûlên ku bi zorê di nava xakeke

hişk û ziwa de şîn bibin bûn. Gelek ji wan hîna baş nedipeyvîn jî, ketîbûne kolanê vê jiyana zor û zehmet de. Ew hîn di temenekî biçûk de, mîn dê û bavên xwe, yan di bin şivan, yan jî dibinê bexçevan û bi bêrên ku ji qama wan dirêjtir bûn, şînahî av didan. Rewşa wan zarokan, mîna tabloyekî ku tevahî hûnerê ressam ji bo wateyekî tirajedîk were diyar kirin bû. Ew ne sehneyek ji tiyatroyeke tirajedîk bû. Ew rasteqîna rewşa gelê me yê başûrê welat bû. Wê çaxê min ji xwe re got:

138

-Ger wênekeşek bi mekîna xwe re were vir û wêneyekî van zarokan bikişîne, wê xelata wêneyê herî tirajedîk werbigire.

Hîna min wisa dinêrî û diponijîm, hevalê Kawa got:

-Hevalno em biçin wê mala hanê xwarina xwe bixwun ji bo ku em zû bighên Kanî Cengê.

Ew mal, li ser rê bû. Gava em gihiştin wir, zilamê malê hîna li ser kar bû. Lê li malê zarokek mîna ên li kolanên gund dileyîstin hebû. Rewşa wî ji ên din zêde ne cewaz bû. Dema em rûniştin min jê pirsî:

-Tu diçî dibistanê?

Mixabin tiliya xwe ya piçûk ji devê xwe dernexist. Te digot qey, bi xendeya lêvên xwe dixwest biyaniya vê gotinê (dibistanê) di ferhenga xwe ya teng de bide diyarkirin.

Di wê kêliyê de bavê wî jî hate mal û li cõvata me rûnişt. Lê awirên min ji wî zarokî cuda nedibû. Min careke din ew pirsa bêbersiv mayî, ji lawik kir:

-Te negot, tu diçî dibistanê?
Hîna peyva min di pêşwaziya livîna lêvên ê zarok de bû, bavê wî bersiv da:
-Di gundê me de dibistan û fêrgeh tune ye.
Bersiva bav, bû mîna bendavekî li pêş pêlên pirsan. Min gelek pirs amade û rêz kiribûn. Lê bersiva tevahî pirsên min, ji bîra min da revandin. Ponijîna min, şûna peyv û pirsan tevan girt. Heya wê çaxê min pirtûka Apê Musa "Birîna Reş" nexwendibû. Lê rewşa vî gundî ku mînaka rewşa başûr e, bi taybet rewşa wan zarokan, weke ku sed carî Birîna Reş bi min dayî xwendin bû. Wan zarokên, di nava jiyana bi êş û zehmetî, nexwende û di nava tarîtiyê de jiyan kirin, pêlên xemginiyê li ber qiraxên dilê me tevan jor û jêr kir. Her ku diçê min dixwest bêhtir li wir bimînin. Mixabin piştî saetêk û nîvê em neçarbûn ku bi rê bikevin. Lê vê demê kurt gelek caran gaziya Cegerxwîn ji Robsor e bi bîra min dianî.
"Ey heval Robso
Dengbêjê cihan
139

Ne tenê reşik
Mane bin destan,
Ew jî sipîne
Mane parîşan"
Lê êdî Cegerxwîn jî nebû ku, vê rewşê bilêv bike. Tenê me bi awirên xwe, temaşe dikir û êşan par dikirin. Dîmenê wan zarokan, navê Qendîl û Xinêre jî, ji bîra min bir. Dema em bi rê jî ketin, her kêliyekî min li wê malê û bi taybet wî

zarokê ku heya bihnekî jî, destê xwe ji me re dihejand, dinê-
rî.
Piştî wê rojê em pênc rojên din jî meşiyan. Tevî ku min
gelê deverên weke Kanî Cengê, Dola Ayşê, Berde Nazê,
Berde Sorê, Hecî Umran, Kela Şînê û hwd. dîtin ji ew gund û
zarok ji bîra min nediçû. Te digot qey, rûpela bi navê Xinêre
jî li ber vê dîtinê winda bû. Êdî ew zarok bibûn
desthilatdarên xeyalê min. Eger ez bibêjim; min wê çaxê
Halepçe û Filîstînekî nû dît, wê neşaş be.
Ew dîmen bû mîna wêneyekî û dilê min jî jê re bû
çerçewek (pîrwaz). Heya niha jî di şûna xwe de ye û wê her
di wir de jî bimîne.
Xelîl Cibran

WÊRAN

Laleş Qaso
KomaL
Weşanxane: KomaL
Wêneyê bergê: Hadî Ziya Umînî
Çapa duduyan: 2009
BEŞÊ YEKÊ
1
Hewrên belek belekî di ser Zorava re hevdu pîne dikirin
û ber bi rohilat de diherikîn. Ezmanê ku ji hêla Serhedê
ve şîn vedabû, di nav darên behîvan re wek ava okyanûsan
xuyanî dikir. Barana şevê xwe bi nav bihara Omeriya
de berdabû, gîha şûştibû û bûkîna dawî jî di kulîlkan de
vekiribû. Erd têr av bûbû. Hilma axê têkilî hilma gul û

rihan û nêrgizan bûbû û hawêrdor difûriya. Gîhayê ku serê xwe wek tîrên nijdevanan ber bi rokê de rakiribû, di bin baqên tîrêjên wê ên zêrînî de diçirisand û bi bayê sibehê re diricifî. Kurmikan xwe pê ve daliqandibûn, serî dikurisandin; kêzikan kok dixwarin; kuliyan dabûn nav û dipelixand; û karwanên gêrikan jî bê piştî û bar, berê xwe dabûn çol û beyar û goristanan. Mîna ku ji ber pêlên êgir direviyan, bêserûber dabûn ber hev, bê reqs û sema li hev dinerîn, bê reng û ceng tevdigeriyan û bi lez diçûn. Deng ji axê dihat, ax diherikî qelş û koncalan. Gul û nêrgiz û teyrikên ku pê dijiyan ne rehet bûn. Qore qora refekî qulingan di nav hewran re, bi haweyê ku wê derek bişelihandana, dihat. Çûkên ser hêlînê bê hizûr bûn. Deng ji şalûran ne dihat. Li hewa jî xuyanî ne dikirin. Bûmekî xwe li ser darên guhîjên binya gund danîbû, her ji bêhnikekê mîna ku dixwest tiştinan bibêje û kes lê guhdarî nake, bi lez şaxê darê dinikiland, dengekî fetisî ji qirikê derdiket, difiriya ser dareke din, li wir jî mîna berê dikir û dîsa difiriya ser dareke din. Gava ku bê pêjin disekinî jî, tam diruvê axan pê diket.

7

Bi girîniya terempêla ku dihat gund re firiya ser dara din û li gund temaşe kir. Terempêleke eskerî bû. Piştî çend kêliyan bi haweyê ku ji tiştekî aciz bûbe, bi lapûşkan ve xwe bi çiquliyekî darê ve daliqand û ha ha vir û wir nikiland. Ji kuştina Sarê û Heso û vir ve karê vî bûmî ev bû.

Çend carekî Circîs çifte jî berdabûnê; lê ne xistibû û dû re dev jê berdabû.

Terempêl li ber deriyê Circîs sekinîbû û gundî jî li dor
wê bûbûn dîwar. Dîwarê ku ji insanan çêbûbû, ji hindama
darên guhîjan feşkilî xuyanî dikir. Pîrek vê carê di nav
komê de tune bûn. Zarokan wek kevokan xwe dabûn ser
hev, ketibûn pişt wan û di bin guhikên perdên pacan re li
komê temaşe dikirin. Hemiyan jî mîna ku zimanê xwe
daqurtandibûn, bê deng sekinîbûn. Roka biharê bi qasî ku
di kulekên berzikên xaniyan re derbasî hinduran bibe,
nizm bûbû. Çûkên beytik bi çîv çîv û çirt vîtkên xwe ên
ser tingan re şabûna xwe li himberî rokê didan xuyakirin.
Birek kûçik li navtara gund li hev civiyabûn. Û hemû jî li
bendî ku hema yek ji wan devê xwe ji hev veke û ên din
bi hev re êrîşî ser wî bikin. Gişan jî tengijî xuyanî dikirin.
Lingên xwe ên paşî bi erdê ve dixijiqandin û habela li dora
hev dizîvirîn. Ji xwe karê van kûçikan jî her wilo bû. Bi
haweyê ku eskeran li gundiyan dikirin, çend heban ên din
hemû li hev vedihewandin û mîna eskeran bi hev re dikirin.
Circîs li wan mabû ecêbmayî, car carê derdiket ferca
wan û bêyî ku wan bi xwe bihisîne dibû hevalê vî û wî û
getf li wî û ên din dixwarin!
«Bila Circîs axa jî bê vir!» got û di nav zilaman re wek
dîkê ku bide nav mirîşkan çû û hat.
Circîs di kuleka qesrê re rabûkirî lê dinerî. Dilê wî çar-
8
pîne lêdixist û xwîna wî bi lez tevdigeriya. Ji wir bang
kirê:
«Ha ha, Atîlla beg, hema ez têm!»
Gotin û hatina wî bû yek. Di xwe re ne gihabû yan jî ji

bîra kiribû ku bi ser şerwêl de divabû qutikek jî li xwe kiriba. Tena fanêreyê sertazî û xwas hatibû. Û ew yeka han jî li gora prensîpên Atîlla wek bêemriyekê dihat dîtin. Pirça sêngê, sertaziyê wî ê debixî hildabû û zik bi sêngê re kiribû yek. Ji navikê û berjor de derba cewdikê paleyê bi Circîs diket. Şerwalê wî ji toz û terabêlka eşêfa nav rez û firêza pê ve gewr bûbû. Devdelingê wî ê çepê fetiqîbû û navran jî hinekî sist bûbû. Lingê wî ê rastê di xwînê de mabû. Tiliya wî a mezin li kevirekî neqebê ketibû û nenûkê dabû goşt. Xwe ne dikuland, serê xwe rakiribû û dihat. Ruyê wî mîna ruyê rêwiyê ku di dûrbînê re xuyanî dikir, tevlihev bû. Çavên wî westiyabûn. Simbêl kişiyabûn heta bi ser çenê. Bi tirs bû. Serê wî ê tazî wek gula ku li ber bê dihejiya, bi vir de û wir de ditewiya.

Xwest ku rahije destê Atîlla û xêrhatinê tê bide. Lê Atîlla xwe paş de vekişand û destê xwe nedayê. Û hema wilo pê re jî destê xwe mîna şûrekî bi ser de hejand: «Tu bi dewletê re xayin derket, Circîs axa. Ma ji xwe mêrik tu carî ne bûye dostê dewletê. Tu bi êgir dilîzî, tu ê bişewitî!» Ji dil keniya, «niha bi rastî, tu bi xwe bawer dikî ku tu ê bi wî serê xwe ê wek şimamokekê bikaribî li himberî me, wan fenbaziyên xwe ên genî bidomînî? Na na, eman eman! Dibe ku mirov bikaribe her kesî bixapîne, lê mirov nikare dewletê bixapîne. Ên te du çav û du guh, ên dewletê çar çav û çar guh hene.» Vê carê jî xwe hêrs kir, «tu û Reyis hûn ê li hevbên, ha! Ji xwe ji berê de hûn

9

hevalê hev bûn; hûn qet ji hev ne xeyidîne. ‘Mar bi mêr re

radizê. Tîjikên maran bê jehr nabin.'Tu ê terorîstên wî bihewînî mala xwe, tu ê bi wan eşqiyan zarokên xelkê û eskerên dewletê bidî kuştin, ha!...»
Circîsê ku li himberî eskeran ji dêvla temamê gundiyan him difikirî û him jî dipeyivî, dev ji xura pişta stuyê xwe berda:
«Terorîstên çi begê min.Tu jî baş dizanî ku em û terorîstan dijminên hev in û me gelek mêr ji hev kuştine. Dibe ku mirov bikaribe bi kafiran re bibe dost, lê mirov tu carî nikare bi dijminên xwe ên xwînê re bibe dost. Me û wan xwîna hev rijandiye.»
Circîs jî mîna gundiyên xwe gava tirsê diavêt dilê wî, car carê diteriqand. Komutan ji gotinên wî ên dawî bi jehrî ket. Hinekî fikirî, gotin anî ser xwe û serê xwe hejand:
«Tu rast dibêjî. Ji xwe ji ber wê yekê ye ku hûn bi me re ne durust in», devê xwe girt û bi wir de meşiya. Reva wî ji ber dixana tepik, sergîn û serkulan bû. Maliyên Circîs li hewşê beroşên nîskê dikelandin. Tenûrên wan jî her tim bi zibil dihatin dadan. Bêvila xwe bi lez firkand. Dû re jî bi lez hat, serê xwe ber bi ê wî de tewand, tiliya xwe a işaretê li ser herdu çavên wî gerand û hêdî bi hêdî got:
«Çavên te pir kûr, dûr û tûj dinerin. Ji min re gelek tiştan dibêjin. Ez di wan re terorîstên ku aniha li mala te rûniştîne, dibînim.»
Bi gotina dawî re ruyê Circîs qulipî û bêhemdî xwe bi haweyê ku wî rast derxîne jî peyivî:
«Qomandar beg, wilehî min nizanîbû ku tu mirovekî ewqasî 'alimilxeybî' jî.»

«Ne tu bi tenê, gelekên wek te bi vî aliyê min nizanin.»
10
Circîs bi xwe hisiyabû ku nebaş gotiye. Di cih de çerx kir û gotina wî birî:
«Piştî kuştina rehmetiyê Heso bi çendeyekî, Reyis du zilamên xwe şandin gund ba min û doza lihevhatinê bi min re kir. Lêbelê min jî cewaba hemiyan da.»
Atîlla digel ku ew kes nas dikirin û ji serî heta binî bi meselê dizanîbû jî, dîsa pirsî:
«Kî bûn ew herdu zilam?»
«Min nas ne kirin. Bi zarekî serhedî dipeyivîn.»
Nas dikirin. Yek omerî, ê din torî bû. Ê omerî mirovekî ku bîst-sîh sal berê du unîversîte qedandibûn, li ser doza kurdan bi salan di girtîgehan de mabû û di nav xelkê de welatperwerekî jîr û zana dihat naskirin. Lêbelê ê torî ji bav û kalan de axatî kiribû û xwe tirtireyekî axan didît.
«Lê tu dizanî bê çi ji te re gotin.»
«Ma çawa ez nizanim, begê min.»
«Bibêje!»
«Li ser herdu çavên min. Bi rastî herdu mirov jî beredayî bûn!»
«Çima?»
«Reyis xistibû serê wan ku Reşo li ber çavên bîst-sîh çekdarî Serdar kuştiye û çekdaran jî Reşo ji ber wê yekê dane mehkemeya xwe. Mehkemeyê cezeyê mirinê dayêyê û wî jî ew efû kiriye. Reşo jî hingî ji ber xwe fedî kiriye sewsî bûye û bi demaçeyê êrîşî ser Menca Xerzî kiriye. Piştî ku Mencê dikuje, vê carê jî xwe dikuje.»

Yuzbaşî beşişî, ruyê Circîs vebû.
«Ê, li ser kuştina Kenêr, Sarê û Heso çi gotiye?»
«Gotiye ku komutanekî min î ajanê Tirkiyê ew kuştine
û min jî ew komutanê xwe bi kuştinê ceze kir.»
11
«Baş e, ji bo Hemo û Sadiq?»
«Ji bo wan jî gotiye ku li Iraqê berzaniyan ew kuştine.»
Circîs rast digot. Reyis bi wan re wilo peyivîbû; ketibû
serê wan û wan jî xwestibû ku wilo têxin serê wî. Circîs bi
tiştekî Reyis bawerî ne anîbû. Lê li ser ku çima Reyis
termê Menca Xerzî û Reşo li Qamişlê veşartibû, pir ponijîbû.
Di dawiyê de ew jî wek feneke ku Reyis bi malbata
wî û bavê Mencê re kiribû dîtibû. Bavê Mencê mirovekî
xwedî hêz bû û Reyis jî ne xwestibû wê hêzê ji dest xwe
berde. Parastina Mencê, wê li fêda wî ba. Hîn jî wilo difikirî.
«Îcar ji ber wan bêbextiyên ku bi malbata te re kiribûn,
tu pê re li hev ne hat?»
«Na. Ava me û wî di cokekê re naherike. A me di coka
dewleta me û a wî jî di coka dewletên ereban re diherike...
»
Yuzbaşî ne xwest ku li gotinên wilo guhdarî bike.
«Wekî din çi gotiye?»
«Gotiye ez ê du sed hezar markî bidim Circîs û bila ew
jî bi malbata xwe ve ji gund bar bike. Min qebûl ne kir û
dinya xerab bibe jî ez ê ji gundê xwe dernekevim!»
Li herêmê gundiyên ku beşdarî nav refên çekdaran ne
dibûn, eskeran jî ew mecbûrî pîberayetiyê dikirin. Çekdaran
jî bi navê alîkariyê pere li ber wan dixist da ne bin

pîber û bar bikin. Gelek gundiyan ji çekdaran alîkariyeke
sivik girtin û gundên xwe berdan.
«Baş e, dû re çi bû?»
«Dû re, ji zilamên wî kesek nema bi ser min ket...»
Piştî demekê eynî zilam dîsa hatin mala wî. Di dawiyê
de li ser ku ne wê çekdaran êdî bigirtana ser gund û ne jî
12
wê peyayên wî bi eskeran re bidana ser şopa çekdaran, li
hev kirin. Circîsê ku peyayên wî bi eskeran re tu carî derneketibûn
taqîbata çekdaran, bi vê lihevhatinê pir kêfa
xwe anî. Aşitî dermanê xwe ê herî bedew dît û destê xwe
bi carekê ve ji berberiya bi partiyê re kişand. Bi wî rengî
her tişt tibabê salekê baş meşiya. Lê piştî ku çekdarekî ji
çiyayên Omeriya xwe bi birîndarî gihand gund, lawên Circîs
ew li gund veşartin û birîna wî derman kirin, nav wan
û çekdaran hêdî bi hêdî xweş bû û mala Circîs ji wan re bû
wek asîgehekê. Di eslê xwe de heger çekdar ewqasî merd
nebûna, devê tûrê xwe ên mark û dolaran ji lawên wî re
venekiribana û lawê wî ê ku ji zaroketiya xwe de hînî
qumarê bûbû, bi van pereyan bi qumarê ne lîstibaya, dibû
ku law jî wek bavê bifikiriyana û dev ji dan û stendina bi
wî haweyî berdana. Ne ku di derbarê gelek tiştan de wek
wî ne difikirîn; di fikarê de hema hema her kes mîna wî
bû. Lê gava mesele dizîvirî ser kirinê her tişt dihat guhertin.
Mark û dolaran zarok tahmişkî kiribûn û serî li Circîs
gerandibûn. Pêşiya xwe didît û tiştê ku ji dest dihat dikir.
Têdigiha ku heger bi vî haweyê niha bimeşe, wê ecêbên
mezin bên serê wan. Lê her tiştê ku digot, mîna dohnê ku

mirov di qûna berêz bide, fêde ne dikir. Carina gava bi
tenê dima ji hebûn û nebûna xwe diket şikê; diqêriya da
hin bersiva wî bidin.
Atîllayê fermandar Circîs him wek heywanekî kedîkirî
didît û him jî jê ditirsiya. Di bin çavan re lê nerî, awir têfirandin
û bi qiriçandina diranên xwe re dengê xwe hilda:
«Ez bi temamê fisekiyên ku te kirine dizanim. Digel vê
dijminahiya ku tu bi me re dikî, dîsa jî me gelek caran li
ber guhên te xist ku tu mala xwe bi xwîna wan rezîlan
13
qirêj nekî. Lêbelê te bi a xwe kir û tu bi a xwe dikî. Te mal
kiriye nexweşxaneya terorîstan, cebilxane, mêhfanxane û
aşxaneya wan. Heger wilo bimeşe, bizanibe ku wê dawiya
te pir û pir xerab bê!...»
Circîs bi qasî ku ji Reyis ditirsiya wilo jî ji vî komutanî
ditirsiya. Serê xwe xistibû ber xwe û bi hêdîka digot,
«na begê min, na na...»
Lê begê wî ê ku mirov digot qey xerîte di serê wî de bû
û her der mîna kefa destê xwe nas dikir, yek ji yekê pêdixist:
«Te bi destên xwe ji terorîstan re xwarin biriye newala
Çêlkan. Hûn li newala Dojderê bi carî hev ketine. Te ji
wan re tûtin biriye şikeftên Zivingê. Tu bi doktorê ku min
serê wî ji hev belav kir re çûbû şikeftên Rişwanê!...»
Ev hemû li Circîs rast bûn. Behetî mabû! Di van
kêlîkan de tiştê ku wê bûbûya, ji bo malbatê û gundiyên
xwe felaketa herî mezin didît! Şika ku komutan pê dizanîbû
heft çekdar jî niha di mala wî de rûniştîne, pê re
çêbûbû. Paxafê girtibû hinavên wî, dil sivik sivik lêdixist

û di ser hev re dibihurî. Temamê xerabiyên dinyayê xwe dabûn ser hev û mîna dewla ku bi lez di çirikê re diherikî bîrê, di ber çavên wî re pêl dibûn. Circîs xwe ne ji dêrê û ne jî ji mizgeftê dikir. Di wextekî de qerfên xwe bi bûblaniyên ku ji bo xatirê melê bi cenabet diçûn mêja sibehê, dikir. Û niha jî ew bi wî karî rabûbû. Tu şika wî ji Reyis tune bû. Ew wek yuzbaşiyê girtîgeha Diyarbekirê didît. Lê ji bo xatirê dilê çend zarokên xwe jî çekdarên wî dihewandin mala xwe. Xwe xistibû diruvê misilmanê ku rojî digirt û limêj ne dikir. Bi çekdaran re rûdinişt û dişêwirî; lê tiştek jî bi a wan ne dikir.

14

«Tu têkiliya min bi terorîstan re tuneye. Ez ne dostê wan im. Qomandar, ez bi sûnda herî mezin sûnd dixwim ku ez ji Reyisê wan nefretê dikim! Ez mirovekî xwedî dijmin im. Dijminên min bi qasî xweliyê pir in. Dijminekî fesadiya min li ba dewletê kiriye û xwestiye ku bi rêya cenabê te çira mala min bitefîne...» Atîlla jî ziq lê dinerî û dikeniya. «Ez bi dewletê re me û min dewlet her tim jî di ser her tiştê xwe re girtiye. Ma mirov dikare çavên xwe derxe? Na. Dewlet çavên min e. Mirov nikare dest û lingê xwe jê bike; dewlet dest û lingên min e...»

Circîs lê vebûbû û wek avê pê de diçû. Û Atîlla jî ji şelafiya bi wî rengî hez ne dikir. Him ji xwe tu pêwistiya wî bi şelafiyê jî tune bû. Mêrik, eroîna ku di ser Cizîrê re dihat, xistibû destê xwe û dinyayek mark û dolarên wî çêbûbûn. Û bi ser de jî bi qasî hejmara tabûrekê, mirovên gundî û çekdar kuştibûn. Serê insên ji gewde dikir. Insan

dişewitand. Li pêş çavên dê û bavan li keçan siwar dihat.
Ne şelafiyên Circîs û ne jî dohnê dûvê beranên Serhedê
wê bikarîba dilê wî nerm bikira.
Piştî ku bi hêrs ji eskerên xwe re got, «wî bêşerefî pêş
vî bêşerefî bikin!» û eskeran jî çekdarê ku di cemseyê de
devdevkî vezilandîbûn anîn wê navê, bêhna xwe tengtir
kir û bi herdu destên xwe re dengê xwe hilda:
«Circîs axa! Îcar tu ê çi gûyî bixwî!...»
Circîs hilmekê xwe weritî dît. Lê wî ji cihê ku lê mabû
xwe beşişand û dewam kir:
«Dizane, lawê dêya xwe dizane bê wê çi bibêje.» Hêrs
bû, çavên wî di nava serê wî de reqisîn, xwe lê rakişand,
bi qurmê rîha wî girt û xwe bi ser de zirzitand:
«Ez ê wilo bi rehetî dev ji te bernedim terorîst», got û
15
dahf da.
Circîs piştî ku bi lez rabû ser xwe û herdu destên xwe
hejandin, wilo jî bi lez got:
«Yaho em bi we re mane heyirî, beg hezretlerî. Em bi
mal û canê xwe alî we dikin, em dibin terorîst; em alî we
nekin û li mala xwe rûnin, vê carê jî em dibin wetan xayinî;
em alî çekdaran nekin û wan nehewînin mala xwe, em
dibin milet xayinî û ji me re 'cahş-hêşek' dibêjin. Ê ma
wilo dibe qomandar beg?»
Bi gotina wî a dawî re ji nişkê ve çelq li eskeran ket û
bi vir de û wir de çeng bûn. Komutên demaçeya xwe
kişand û ber bi hewşê de beziya. Çend eskeran xwe gihandinê.
Hin esker bi wê navê de reviyan û hinan jî xwe

avêtin erdê û berê sîlehên xwe dan gundiyan.
Kûçikên ku li navtarê li kuştina hev digeriyan, bi qehr
xwe dadabûn hev û hemû bi hev re bi haweyê ku hevdu
bixwin direyan. Mîna eva niha li gundekî Torê jî bûyereke
wilo qewimîbû û gelek esker hatibûn kuştin. Esker bi
dû şopa zilaman ketibûn. Zilaman jî jin û zarokên xwe di
gund de hiştibûn û beşdarî nav çekdaran bûbûn. Eskeran
jin û zarokên wan derxistibûn ser bênderan û li wan dixistin.
Di wê navê re birek çekdar jî li gund rûniştîbûn. Qîr û
hewarên pîrek û zarokan dabû nava wan û hemiyan bi hev
re êrîş berdabûn eskeran. Lêbelê çend kûçikên ku ji çekdaran
dexs girtibûn, bi haweyê ku eskeran biparêzin xwe
dadabûn wan û bûbûn sebebê ku bi çend kesan ji wan re
gelek pîrek û zarok jî bên kuştin. Bi rastî jî li gelek cihan
gelek kûçikan mîna ku a xwe li çekdaran kiribûn yek, tevdigeriyan
û eman ne didan wan. Ew keft û lepta wan hiştibû
ku Reyis biryara kuştina wan bide û di herêmê de qira
16
wan bê. Lê ne bi tenê çekdaran, eskeran jî kûçik dikuştin.
Helbet, gelek kûçikên ku dijminê ekeran jî bûn hebûn.
Circîs jî di destpêkê de hebitî. Lê hema pê re jî sebêbê
reva wan fêhm kir. Stuyê xwe wek çûkê ku liba di zimanoka
şaqûlê de dinikiland, ber bi komutên de dirêj kir û
melûlekî got:
«Qomandar beg, kûçikên me jî li me çûne: Car carê
hema wilo ne li ser tiştekî li hev vedihewin û pev dikevin...
»
Komutan jî mîna ku hîç tiştek ne qewimîbû, tena tena

meşiya û xwe bi ser çekdarê ku çerm û hestî mabû de tewand:
«De ka bibêje rezîl!...»
Çekdar xortekî sipehî û bi qasî tayikekî jî dirêj bû. Bîst û du-sê salî dihat. Kubariya laşê wî di qirika wî a gewr û boz de dida der. Ji ber xwe fedî jî dikir. Bavê wî dêrikî bû û axayekî di ser xwe re bû. Di odeya bavê de mezin bûbû. Eskeran bi bavê re du birayên wî jî kuştibûn. Di çar mehên ku di êşkencexaneya tûgaya Mêrdînê de mabû, sipîkê avêtibû ser çavên wî. Hema hema didît. Herdu çavên wî çûbûn xwarê û sipîka ku mîna cûmên nîvişkê dida devê meşkê, wilo kûr xuya dikir. Rîha wî a ku di xwînê de sor bûbû, gilokî kişiyabû. Mîna melevanê ku diket ber pêlên behrê, ne difetisî û ne jî xelas dibû, ewqasî westiya bû. Di êşkencexaneyê de ji desthilanîn ne ketibû û heta ku tîman li pêş çavên wî dest ne avêtibûn xuşka wî jî, li ber xwe dabû.
«Di şerê ku me di qelaçên van gundan de bi eskeran re kiribû, gule li zendê min ketibû. Min û hevalan me hevdu winda kiribû û ez bi tenê mabûm. Zendê min werimîbû û
17
pir diariya. Ji neçarî min berê xwe da vî gundî. Li pişta gund du kesên ku bi sîleh nobet digirtin, ez girtim. Min xwe avêt bextê wan da min nekujin, çend rojekî min li gund bihêlin û zendê min derman bikin.»
Komutên bi zirt:
«Tu li gund hiştin û zendê te derman kirin?»
«Erê.»

«Tu çend şev û çend rojan li gund ma?»
«Du şev û du rojan.»
Heta vir jî Circîs û gundiyên wî ji xeberdana çekdêr ewqasî ne tirsiyabûn. Lê piştî ku komutên geft li ê çekdar xwar û mîna conegeyekî spanî xwe kil kir, «bêşeref, tu çima tiştên ku te li tûgayê ji me re digotin nabêjî, hi! Tu li mala kê dima!» û wî jî got «ez li mala lawekî Circîs dimam», xwîn li hemiyan vemirî.
Circîs carekê bi darî wî ketibû. Herduyan jî hevdu nas dikir. Wî û gundiyan jî.
«Kîjan lawê wî?»
Du esker ketin bin çengên wî û ew li nav koma zilaman gerandin. Bêhnek ne ket wê navê, destê xwe ber bi Cidhên de vekir, «ev bû» got, kuxuya û di cih de rûnişt. Bi kuxukê re peşkên xwînê pekiyan ser ruyê eskerê di kêleka wî a çepê de. Esker jî piştî ku bi dizîka û sivik kulmiskek-dudu avêtin devê wî, wilo jî ew rakir û diranên xwe lê qiriçandin. Canê lêwik mîna dara ku bi bayê seherê re dihejiya, bi carekê ve diricifî. Ketibû tayê. Mirinê di kabokên wî ên fisyayî û ruyê wî ê zervedayî de xweş xuyanî dikir. Di eslê xwe de ew ji zû de miribû. Têgehên eşq û evîna wî a ku bi nêrgizên welatê wî re bûbûn yek û di qahfûrkê serî de
18
dilîstin, ji zû de govend betal kiribûn. Dinyaya ku hîn ji zaroketiya wî de li ber çavên wî bê dawî diyar kiribû, bi dawî bûbû. Ew gula ku di ronahiya rizdên zinarên mejiyê wî de geş bûbû, bahozê rakiribû. Ji wan xeyalên wî ên ku weke çemekî bê serî herikîbûn, eser ne mabû. Bi tenê hew

dizanîbû ku hîn jî heye, ewqas.
Bêhna Circîs dîsa hat ber. Û heta hinekî kêfa wî jî hat.
Cidhanê araqvexwir bi qumarê dilîst û mala wî li topê xistibû.
Cidhan reşxeriqî û wek wan sofiyên ku di neqeba
Sefwa û Merwayê de Şeytan diricimandin, xwe bi ser çekdêr
de kil kir û bê ser û ber peyivî:
«Bênamûso derewan li min dike! Kesek ji me wî nas
nake. Ne hatiye vî gundî. Ev hemû wilo bêşeref in! Yanî
me gû xwar ku me birîna wî derman kir, hi!...»
Ev Cidhan bi rastî jî wek ku Circîs digot, carina xwe
pir beredayî dikir. Zilam in wilo hene ku mirov ji ber bejin
û bala wan fedî dike ya jî dihenitîne. Simbêlên wan li pişta
guhên wan disekine. Simbêlboq in. Sermezin û pozberanî
ne. Diruvê axan, beg û mîrekan bi wan dikeve. Lê gava ku
hat û mirov bi wan re rûnişt, bi çavekî mezin li wan nerî û
li wan guhdarî kir, mîna ku mirov bi hirçekî re li ser şelim,
tivir û pîvazan diwenise. Ewqas hêviyên mirov têk dirin û
mirov ji exlaqê xwe derdikeve. Aha ev Cidhan jî yekî wilo
bû. Xwe avêtibû ser çekdarê ku di xetera mirinê de bû; ha
ha tif dikirê û bi vir de û wir de gotin diteriqandin. Vî Cidhanî
wek eva niha lê bi haweyekî din wilo li jina xwe jî
kiribû. Jinik bi qasî qarotekê zirav û ew jî bi qasî conegayekî
xişin bû. Li Hûto çûbû. Di ser şîvê de dilê jinikê dilerize;
bi sênga xwe digire û serpiştkî xwe li erdê vedizilîne.
19
Cidhan jî hema pê re xwe diavêje ser zikê wê, bi herdu
destan serê wê kil dike û dibêje, «dêya zarokan, dêya zarokan!...
» Li gora ku zarokan digot, heta ku bavê wan xwe

ne avêtibû ser jî, dayika wan li ber xwe dabû.
Keft û lepta Cidhên li hesabê komutên jî ne hatibû.
Fêhm kiribû ku çekdar miriyekî ji saxan e, dilê wî ji gundiyan re dixwaze û hema piştî çend seetekî din jî wê bimire.
Lêxista dikarîbû di cih de bimira û bi ser de jî rastiya ku pê dizanîbû wê derew derketa. Zimanê Circîs lê dirêj dibû.
Komutên bi pehîna ku li defa sênga Cidhên xist û Cidhan di ser hev re qulipand, wilo jî yek li zikê çekdarê ku rewa di hêt û pêtên wî de ne mabû xist û ji eskerên xwe re got:
«Vî lawê dêlikê biavêjin cemseyê!»
Eskeran ev xortê ku ji dev û bêvilê xwîn dipijiqî, bi dû xwe de kişkişandin; di nav xwe re bilind kirin û mîna zebeşekî avêtin hindurê cemseyê. Heta ber cemseyê jî xirîniyeke pir bi hêdî ji qirikê derdiket. Bi avêtina wan re ew deng jî betal bû.
Komutanê ku mîna hilqizmilqiz di cihê xwe de ne ditebitî, piştî ku çend şiqam bi Bedrên ve zeliqandin û tiştek jî jê re ne got, berê xwe da Circîs û bi ser de hilbû:
«Tu mirovekî durû yî. Bi roj tu bi me re yî û bi şev jî tu bi terorîstan re yî, deyûz! Ji îro pê ve qîma me nayê ku peyayên te jî bi eskerên me re dernekevin çiyê û li terorîstan negerin. Ya ev û yan jî koçkirin. Ya tu ê bi hemû haweyî wek me bikî û yan jî tu ê ji vî gundî bicehemî!...»
Circîs xebera ku hîç ne dixwest bibihîsta, vê carê jî ji vî komutanî bihîst. Komutên çere mere nizanîbû. Dewlet

bû. Û heta di herêmê de imperetor jî bû. Circîs fêhm kiribû ku êdî mijar çendî cidî ye. Şerwal çirvirîbû, pîne xêr ne dikir. Di vê navê re gelek gelek tişt pev re hatin bîra wî. Kufletê wî giran bû û koç jî «malwêranî, pavyon, kerxane, qewadî, qûndekî, pars û xela» bû. Ma bi tenê ew, koçê ziman jî têk dibir. Bi sed hezaran kesên ji bedena wî, li nav tirkan perîşan bûbûn û li parsê hesilîbûn. Di qorzîbirên kolanên bajarên wek Izmîr û Stenbolê de birçî û tazî radiketin û di nav kerş, qirêj û gemarê de li gezeke nan digeriyan. Gelek keçan dev ji malbatên xwe qeriyabûn, di bar û pavyonan de kar dikirin. Gelek keçan xwe di sikakan de pêşkêşî qeprax û qewadan dikirin. Pêxwasan zarok ji vî bajarî direvandin bajarên din, zikê wan diqelaştin û di qaçaxa eroînê de bi kar dianîn. Û hinan jî dest û lingê wan dişkenandin, li ber mizgeftan datanîn û bi wan pars ji xwe re dikirin. Jinên ku xatûnên gundan bûn di nav malên tirkên herî bêrûmet de jî cêrîtî bi dest wan ne diket. Û bi ser de jî zarokên wan bûbûn tirk. Circîs bi van hemiyan dizanîbû. Dizanîbû ku zarok ro bûn û ax jî bi rokê dikemilî.
Ziman bi zarokan li ser xwe dima; zarok milet û milet jî zarok bûn. Wilo jê re gotibû Erol Efendî. Kenêr bi gotinê qirika xwe çirandibû û jê re gotibû ku nekurdbûyin, bi tenê ji pîberayetiyê pêk nayê Circîs axa. Nekeve bin tesîra propeganda Reyis û hevalbendên wî. Çawa ku insan bi avê, xwarin û hewê heye, em kurd jî bi zimanê xwe, kultur û axa xwe hene. Bi koçê re wê ev hemû winda bibin, ezbenî. Helbet pîberayetî tiştekî eyb û kilêt e, bi me nakeve. Lê ez xulam, tişt ji tiştan mezintir hene. Divê mirov

bide ber hev û li wê gorê kabên xwe biavêje. Hişê xwe bîne serê xwe û li dek û dolabên kurddijminên ku bi Reyis

21

di serê me de digerînin, binere. Di vir de hebûn û nebûna me pêşker e. Pîberayetî tiştekî guherbar e. Lê hevalbendiya bi Reyis re jî tunewar e. Reyis bi xwe pîberê herî mezin e. Ferqa wî û pîberan ew e ku wî bi xap û xîpan zarokên me li dora xwe civandine, bi dostayî me dikuje û welatê me ji tirkan re wêran dike û pîberan jî raste rast dane dû eskeran û zarokên xwe dikujin. Kuştin ji koçê çêtir e. Îro em ê bibin pîber û sibehê jî em ê bibin tiştekî din. 'Çerxa felekê geh li jêr e geh li jor.' Lê gava ku em ji holê rabûn, yanî me ji welatê xwe koç kir, wî çaxî jî em ê wek kurd tunebin. Mirovê pîber gava li ser axa xwe be, bi zimanê xwe bipeyive û kultura xwe biparêze, kurd e. Lê ne kurdekî bi şeref e. Û herwilo ne serbestî û azadî ye jî. Pîberayetî bi tenê hew wê me ji qirkirina xezeba vî zemanê teres xelas bike, ewqas.

Bêhnekê li ezmên nerî. Perçên hewrên qut qutî di ser gund re ber bi jêr de diherikîn, ezmên belek belekî xuyanî dikir. Tîrêjên rokê di nav perên hewran re rast dikişiyan û germayî bi deştê dixist. Dû re jî bi dilekî şikestî berê xwe da komutên:

«Hema wilo begê min? Ma ne ji xwe em hevalê dewletê ne û em bi dewletê re li himberî terorîstan sekinîne.»

Komutanê ku dizanîbû serokhêzê çekdarên herêma Mêrdînê di mala wî de ye, deng ne bir xwe. Di pişt vî komutanî de ewqas tişt hebûn ku ne Circîs û ne jî ji koma

wî tu kesî karîbû hema tiştek bidîta. Û bi vî aqilê xwe heta dawiya jiyana xwe jî li ser bifikiriyana wê tiştek ne dîtibana; wê tiştek fêhm ne kiribana.
Komutên piştî ku got, «wî kûçikî biavêjin cemseyê» û eskeran jî Cidhan di nav xwe re birin, berê xwe da Circîs:
22
«Ya tu ê bi me re derkevî çiyan û li kuştina terorîstan bigerî û yan jî tu ê ji vî gundî bar bikî» got û ber bi cemseyê de meşiya.
Di eslê xwe de wê hîn gelek tişt bigotana û bipirsiyana. Lê ma hewce dikir, Cidhan di nav destê wî de bû û bi her tiştî dizanîbû. Mêrik wek mirîşka ku mirov bi boçikê bigire, di hindurê cemseyê de qîje wîja wî bû û ji vir û wir dabû nav.
Dema ku ew ji gund bi rê ketin, bûmê li ser darên guhîjan jî firiya û berê xwe da binya xetê. Fir ew fir bû û tu carî nema vegeriya ser wan çend darên guhîjan.
2
Bi çûna eskeran re Circîs berê xwe da êxur û ji wir jî yekser bi neqebên qesrê ve hilkişiya. Wek marê piştşikestî, dev li xwe dikir û di ser hev re diqulipî. Lêbelê hîn ne gihabû devê derî, komutanê çekdaran derbasî hindurê qesrê bûbû û rûniştibû jî. Circîs bi wahc ket hindur û hema wilo li ser lingan herdu destên xwe bi hev re hejandin û çi tişê ku hat ber devê wî got:
«Erê bavê mino, ev tu doza çi li me dikî? Ez û bavê te em ne birayê hev, weh! Tu ne biraziyê min. Bavê te ji Binxetê û ez jî ji Serxetê me. Hûn ereb û em jî tirk in. Ereb çi

ne ku tirk wan bihewînin mala xwe! Baş e, ev hûn çima li welatê xwe şer nakin? Bi sed hezaran hûn kurdên Binxetê hîn jî navê we 'Lacî'ye. Ereb we ereb jî qebûl nakin. Ê me hema dewleta me çawa be, me tirk qebûl dike. Hûn bê cûzdan û peseport û em jî xwediyê cûzdan û peseportan e. Hûn bê mal û milk, lê em bi mal û milk in. Li we qedexe

23

ye ku hûn terîşek erd, dikanekê yan jî xaniyekî li ser xwe tapo bikin û di dayireke dewletê de bixebitin. Lêbelê ê me, em dikarin temamê Tirkiyê li ser xwe tapo bikin û heta bibin mezinê dewletê jî. Dewleta we bi deh hezaran xelkê te bi nav çolên ereban de terqandine û di şûna wan de erebên xwe bi cih kirine. Hûn ne xwediyê xwe û tiştekî ne, tiştekî! Pêşî bi xwe dakevin û xwe ji bin nîrê zilmê xelas bikin. Ku dibêjin Kurdistan û filan û bêvan, min Kurdistan mirdistan navê; taştê, firavîn û şîva min ji ku derkeve ez ew im, ellahumme ya rebî!»

«Rast e apo, gava ku tu bi her haweyî xwe wek yekî tirk bibînî, helbet tu ê jî bibî xwediyê xwe û her tiştî», Gebroyê çekdar got û bi mereq li devê wî nerî bê ka vê carê wê Circîs çi bigotayê.

«Yabo, em tirk, weh!...»

Ji sala ku Ingilîzan, frensiyan û tirkan wek zebeşê ku mirov kêr bike, jêr û jora Kurdistanê kiribûn du felqe û heta bi cihkirina mayinan jî, dan û stendina binxet û serxetiyan bi haweyê kurmanciya kevin bû. Bi tenê ji hev re digotin «serxetî-binxetî» û hew. Her kesî xwe xwediyê malê û bi çavê xortê malê li xwe dinerî. Birayek li jêr yek

li jor ketibû û milkên xwe bi hev re dixwarin. Ev yeka han digel ku ji salên pêncî û berjor de mayin hatibûn danîn û dan û stendin li gundên ser keviya mayinan bûbû bi navê «goruşme»ya ji salê carekê, piştî demekê ji du-salan û piştî salên heftêyî bi temamî ew goruşme jî rabûbû, dom kiribû. Lê piştî ku telebe derketin û telebeyan mîna ku gundî û bajarî ji hev veqetandibûn û ji herdu hêlan qiyametek sinif û tebeqe çêkiribûn, navê «Binxetê» kirin «Başûrê Piçûk» û yê «Serxetê» jî kirin «Bakurê Mezin»,

24

xet qalindtir bû û ew heq û hiqûqê berê di hikmê deh salan de bi temamî têkçû. Li jêr û jora welêt her der tije Circîs bûn. Circîsan birayên xwe bêminet kirin û dest danîn ser milk û malên hev. Jinên ku bi qaçaxî di hidûd re dibirin û dianîn nema dan hev. Li Serxetê dema ku yekî yek dikuşt, heyfa wî ji ên ku li Binxetê jî diman, hiltanîn. Li Binxetê jî wilo bû. Ev tişt hemû rabûbûn.

«Ya exî de ka were rûne, bêhna xwe fireh bike, mirov ji mala xwe bernade mêhvanan», biraziyê wî got û ji ber koma zilamên ku derbasî hindur dibûn rabû ser xwe.

Di eslê xwe de heger Gebro dil ne ketibûya keça dotmama xwe a ku bî mabû û hayê keçê jî jê tune bû, ewqasî ne dihat gund. Lê mêrik bûbû wek xortê ku dil têkeve metika xwe û ji destê eşqa qedexekirî xwe bixwe. Hema her tim li gund bû û ji xaniyên bin qesrê dernediket. Circîsê ku ew ji dupelikiya wî de nas dikir, baş pê dizanîbû ku ne tu dûnde ye, wek alavekî lê nerî, li himberî wî rûnişt û da ser:

«We ji serî de kodika vala li a tije xistiye; we em jî
kirin wek xwe û hîn jî hûn xwe ji ser me venakişînin.
Heger zarokên we jî mîna ên me hebana, we ê bizanîbûya
ku heta mirov zarokekî bi ser lingan dixîne, dêya mirov tê
ga! Heger hûn bi jin bana, we ê bi qedirê namûsê bizanîbaya.
Heger hûn xwedî mal û milk bana, we ê qîmetê
kedê nas kiribaya. Em xwedî mal û milk in. Jin û zarokên
me hene. Eskerekî ku ser û sekehê wî ne hêjaye zoltakî, li
ser we jinên me şilfîtazî dixin felaqeyê, zarokên me digirin
û dikujin. Keda me talan dikin. Me bi qedera xwe lîst
û me bi destê xwe axurê xwe xerab kir. Ev neh-deh sal e
ku me û vî miletî daye dû we û em vê qiriktaliyê dikişînin.
25
Û we jî ji xerabî û tevliheviyê pê ve tiştek ji me re ne kir.
Me ji destê we aqilê xwe berda!»
«Apo aqilê xwe bernede, wek xwe bike», got û sekinî.
Circîs xwe aciz kir:
«De ji xwe re lê binerin bê ji min re çi dibêje! Ma we
kîjan rojê hiştiye em wek xwe bikin, bavikê mino? Hûn
her tim bi devê tivngê bi me re peyivîne. Mirov hûn û cendirmeyên
tirkan ji hev nas ne dikirin.»
«Apo, na na, ne wilo ye. Di her partiya şoreşger de
miheqeq wê çend mirovên xerab derkevin û mîna cendirmeyan
bi xelkê xwe re bikin. Te qernek kiriye, divê tu van
tiştan bizanibî, apê delal.»
Circîs xwe aciztir kir:
«Rast e, divê ez bizanibim bê mirov bi dostayî çawa
dikare hevdu ji fersendê bixîne û dû re jî pê lê bikêyê.»

«Hêdî hêdî, bêhna xwe fireh bike apo. Yuzbaşî tu kiriye barûd û tu bi ser me de şandiye...»
Biraziyê wî ji keftarekî jî bêhnfirehtir û ewqasî jî ji xwe razî bû. 'Ji tira xwe re bi wir de here' digot. Zilamekî wilo bû ku dikarîbû qeşmeriyên xwe bi alimên herî mezin jî bikira. Ne tiştek diheciband û ne jî wî bi xwe tiştek bi ser tiştekî dixist. Tiştê ku mirov bi qîmet didît, wî pîs dikir. Baweriya ku mirov pê dianî, wî bi cahiliya mirov girêdida. Û bi ser de jî derewîn bû. Bêyî ku eniya wî xwêhdan bida, bi seetan dikarîbû derew bikirana. Tedbîr, wek tirsonekiyê dida ruyê hevalên xwe û ew ji her kesî bêhtir bi tedbîr diqerqilî. Li himberî çekdaran xwarin û vexwarin wek qelsiyê rave dikir, lê heta te bixwesta jî kurr bû. Bi qasî gayekî dixwar û qelew jî ne dibû. Li ser bêexlaqiyê xwîn bi xwe ve didît û bêexlaqiya herî mezin jî wî
26
dikir. Ji bilî keçên ku sûretên wan bi Reyis re dihatin kişandin, dest diavêt wan û dikuşt, birek keçên çekdar jî kuştibûn. Dest diavêtê û hema ne bi gelekî jî li ser dikir. Her kes nezan bû, Reyis zana bû. Kesî bi tiştekî nizanîbû, Reyis bi her tiştî dizanîbû. Reyis bi ser biketa, miletê kurd bi ser diket. Reyis bimira, 'ava çeman disekinî' û insaniyet bi carekê ve têk diçû. Reyis û îdeologên xwe ên komunîst wilo xistibûn serê wî. Ew jî him wilo difikirî û him jî wilo tevdigeriya. Têgihiştina wî a zanistî hema hema tune bû. Di devjenga herî sivik de jî di bin de dima. Heq jê dernediket. Piştî ku nema dikarîbû bersiv bida, îcar devjeng serguherî zirzopiyê dikir; xwe diengirand û gotinên xerab

e dikirin. Carina jî wê du-sê gotinên girover bigotana û bi haweyê ku bi her tiştî dizanîbû, xwe binepixanda, heta bi dawiyê nepeyivya û di bin simbêlan re bibişiranda. Lê her tim bi dû devjenkê de heta demeke dirêj jî tênedigiha ku ê li himberî wî xwestibû çi bigota yan çi digot.
«Mêrik xerabe ye, ne we dît bê ji min re çi got! Terbiya Reyisê xwe girtiye. Niha dikare min bike xayinê herî mezin», ji civatê re got û tasek av xwest.
Gebroyê ku tiştekî zêde heyranê Reyis bû, veciniqî:
«Apo, çi xebera pîs heye tu dikarî ji min re bidî, lê ez ê qebûl nekim ku tu heqaretê li serokê miletê kurd bikî...»
Birayê heft xuşkan bû û li ber dilê dê û bavê xwe pir şêrîn bû. Dê û bavê wî pir li ber dan ku bi çekdaran re nekeve dan û stendinê. Lê wek wan ne bû. Gebro ew bêminet kirin û bazda newala Nesarayê. Piştî ku li «Yuksek Savaş Akademîsî»yê li beşê «Guçlu Turk Dîlî ve Edebiyati » sê salan zimanê tirkî xwend û dîploma xwe bi dereca herî baş girt, Reyis jî yekser ew kir komutanê
27
herêma Mêrdînê.
«Na na na, ji bilî min, kufletê min û civata min! Em jî ji miletê kurd in. Me ew serokê te, tu carî wek serokê xwe qebûl ne kiriye, kurê min. Li we pîroz be.»
Ehmed gotin qulipand:
«Circîsê me, xilafî di gotina qumandêr de tune bû.
Mêrik rast digot, ezbenî. Dewlet ji me û bavê me jî bi aqiltir e. Bi hezaran birêvebirên wê hene û hemiyan jî mektebeyên bilind xwendine. Ew bi me dizanin bê em çi dikin.

Pê dizanin ku em çekdaran dihewînin mala xwe. Mêrik bi devê xwe digot ku aniha çekdar li mala te rûniştîne.»
«Zanebûna wan ji berîberdaniya me û birêvebirên me tê. Xwezîka zana bana. Mirovên bi aqil zilmê li ehmeq û belengazan nakin», Bedrên got û li teqla gotinên xwe fikirî.
Gebro bi xwe ne xweş anî:
«Partiya me ji birêvebirên dewleta tirkan pir jîrtir û zanatir e. Ew partî ye ku bi milyonan insan dane dû xwe û eskerên tirko ji temamê çiyan bi der kirine...»
Circîs «weh çawa», got û dewam kir:
«Kuro insan li vî welatî neman, insan! We kîjan çiya ji eskeran xalî kir? Aha va ye çiyayê Omeriya di bin guhê me de ye. Ma hedê bavê kesî ye ku ji ber eskeran herênê! Omeriya ku bexçê vê herêmê bû bi carekê ve wêran bû, wêran! Derdora me tije wahş bûne. Bi şev dikevin hindurên me.»
Gebro wek çûkê ku xwe di teşta avê dake, ji nişkê ve herdu destên xwe bilind kirin:
«Ya exî cahşên çi, ewqasî jî nabe, xeyo! Me cahşên vê herêmê tev jin û zarokên wan hemû kuştin. Bi tenê li
28
gundê Herbê û Cibigrawê çend kes mane, ew jî hîn em li wan vala ne bûne.»
Civat di bin simbêlan re pê dikeniya û Circîs jî mîna roviyê di zinêr de ziq li herdu çavên wî dinerî. Di dawiyê de xwe ne girt û dîsa pê de pijiqî:
«De îcar ji xwe re li me û vî hevalê Proler Mihê binerin, kuro!»

Hesûkê ku bêdiliya bavê xwe ne dikir, dixwest her tim bavê wî bipeyivya û ew jî di bin simbêlan re bikeniya, li qorziya qesrê li ber qetremîzê dimsa cewrişî rûniştibû û nanê xwe di qetremîz dadikir, berê bavê xwe da Ewrupayê:
«Çawa yabo, çawa? Ma mêrekî wek Proleter Mihê hebû qey!»
Circîs dîsa wek her carê got:
«Erê yabo qurbano, mêrik piştî ku li vir qûn li me qetand, îcar birin Elemanyayê û vê carê jî qûn li ê wir qetand. Kirin mezinê temamê mehkemeyan û wî jî ha ha xelk idam kirin. Erê kuro, piştî ku rê di mezelan de nahêle, îcar henekê xwe bi wan elemanên ku guhên wan dilebitîn dike û li ser navê miriyan benqekê vedike û dibe midîrê benqeyê. Bê kê bîra wilo dibir, ecêb nedîno! Lawo ev çawa insan e, xelk dimirin jî jê xelas nabin, kuro!»
Proleter Mihê vê dawiyê jî li Elemanyayê bûbû serokê «Fonda Miriyan.»
Gebroyê ku guh li yekê ji van ne kiribû, dîsa a xwe got:
«Me cahşên hêla Serhedê jî hemû kuştin.»
Circîs bi herdu destan û bi rengekî ji ser xwe çûyî:
«Lawê bavê min, ev te aqilê xwe xwariye, kuro cahşên çi!»
29
Wî ew deng ne kir. Mîna feqeyê ku di sehara sibehê de çavlixewî, ji dêvla mela ve qaşo dikebirand, selewat, tekbîr, ayet û derzên xwe tev li kebirandinê dikir û bang dida, lê hatibû. Heger dengê wî neşibiya ê zîxanan, belkî deng çûbayê û bisekiniya. Lê mêrik her gava dipeyivî, zor dida

xwe ku dengê xwe qalind derxe. Ji asasê meselê bêhtir hişê wî çûbû ser wir û Circîs jî ha ha diajot ser. Gelek caran wilo lê hatibû.
Mîrzoyê Mitirb xwe di ber wan re rakir:
«Ya xeyo-heval, em serxetî ji berêz re wahş dibêjin.»
Heta vir jî fêhm ne kiribû. Lê piştî ku Hesûk jî got:
«Gebro Gebro, bavê min behsa wahşan wahşan, yanî berazan dike», nuh fêhm kir, devê xwe girt û vekir, xwest ku bi haweyekî sivik kuçê li xwe babide, lê xerabtir kir.
«Li ba me, em ji cahşan re wahş jî dibêjin», got û li herpênc hevalên xwe ên ku derbasî hindur dibûn temaşe kir.
Hevalên wî yek ji kurdên Êrîvanê, yek ji Bokanê, yek ji Wanê, yek ji Silêmaniyê û ê din jî ji Duhokê bû. Herduyên başûrî pir milayim xuyanî dikirin. Ji mêrkujan bêhtir derba derwêşan bi wan diket. Mîna keçikên ku bi dizî di bin çavan re li xortan dinerîn, wilo li civatê dinerîn. Bîst û heft-heşt salî dihatin. Herdu jî bejintîtalî û xwînşêrînî bûn.
Reyis çend salekî li akademiyê bi herduyan jî beşê «Buyuk Kîn» û dû re jî beşê «Buyuk Nefret»ê dabû xwendin û yek ji wan jî di xwendina xwe de bi ser ne ketibû.
Kîn û nefreta li himberî xayinên partiyê bingehê şer û pevçûnê bû. Mirovê ku rehma xayinan têketa dilê wî, xayintiya herî mezin bi partiyê re dikir. Îdeologên partiyê bi van gotinan ji wan re qirika xwe qelaştibûn. Îcar mîna
30
Gebro ji dêvla ku di devê xayinan de bimîztana, tew bi dizî du şûşe av jî dabûn şêst û neh çekdarên di zindana

partiyê de. Digel ku nobedar jî bûn. Bavê wan alim û dayikên wan ji malmezinan bûn û bi terbiya dê û bavê gihabûn. Birêvebirên partiyê bi rojan ew birçî hiştibûn, bi mehan ew xistibûn zindanê, her roj li wan dabûn û dîsa jî kîn û nefret bi wan re çênebûbû. Di dawiyê de Reyis sûretê xwe bi wan re kişandibû û ew teslîmî Gebro kiribûn. Sûretkişandin parola kuştinê bû. Piştî kuştinê jî sûret di kovara bi navê «Buyuk Kahraman» de derdixistin û bi qehremaniyê ew dibirin ber perên ezmên. Di vî warî de Gebro pir bi serketî bû. Ji bo ku têketa çavên Reyis, ji tîfoyê bêhtir hevalên xwe kuştibûn.

Bi hatina çekdaran re deng û rengê civatê hat guhertin. Her kes bêhnekê bê deng sekinî û serê xwe berda ber xwe. Lê Circîs berê xwe dabû Gebro û li cemala wî dinerî. Tiştekî ku wê bihecibanda tê de ne didît. Bi rastî Gebro bi hingiv re jî ne dihat xwarin. Di vê kêlîkê de bi serê xwe ê piçûk, bi çîmên xwe ên qeysikî û zendên xwe ên misasî, tam dişibiya turliyên ku ji çemê Zorava av vedixwarin. Çavbeqî, rûçaroxî û porbizinî bû. Çena wî a dirêj bi rîha wî a kişyayî re ketibû diruvê melkesa sorsorkê. Devçatirî bû. Diranên wî mîna bizara destan, her yek bi tena serê xwe li derekê şîn hatibûn. Gava ku dikeniya devê wî mîna devê şikeftê vedibû û bîst û heft diranên wî ên kirizî, bi hev re tazî xuyanî dikirin. Guhên wî mû ji xelekên cencerê bernedabûn. Lê bêvila wî li a pîrekan çûbû. Lêvên wî jî. Tiştekî wî û mêrên bûblaniyan bi hev ne diket. Di temamê herêmê û heta belkî di temamê Kurdistanê de jî mêrekî di tayê wî de tune bû. Lê Circîs hîn jî bi wirtir çûbû, «ev

lawik ne ji kurda ye» gotibû û ji ber wê yekê jî him xwe ji dêya wî xeyidandibû û him jî keça xwe ne dabûyê. Bi ser de jî navê pêşiyê bûblaniyan lê kiribûn. Lê kesî ew bi navê Gird Elî hilnedida.
Piştî ku Hesûk ew bêdengî xerab kir û got «hevalino, hevalê we di we hildabû», Selîm peyivî:
«Ji xwe her tim wilo bû ye. Yek hatiye girtin deh, deh hatine girtin pêncî dane dest. Xwe li ber êşkenceyê nagirin û li her tiştî mikur tên.»
«Na, ne wilo ye! Hevalên xayin hevalan didin dest dijmin. Hevalê ku tam baweriya xwe bi Reyis aniye, li xwe danayine ku di êşkencexaneyan de bipeyive û eskeran bîne ser hevalên xwe», Gebro got û dîsa ziq li Circîs nerî. Xeberdana wî bi Circîs zor hat; awir têfirandin û bi deng got:
«Ma Heso xayin bû? Ma Mela Salar, Kenêr û Erol Efendî xayin bûn ku li êşkencexaneya tûgaya Mêrdînê ji aş û baş de dipeyivîn? Na. Dar û goşt li hev nake. Ne karê her kesî ye ku xwe li ber zilm û zorê, pîkol û lêdanê bigire.
»
Gebro xwe li gotinên berî niha ne kir xwedî û bi haweyekî devliken li devjenga çendeyekî berê vegeriya:
«Apo, ev herpênc heval jî bi jin û zarok in.»
Yek tenê bi jin û zarok bû. Bi destê xwe ê çepê mirovê bokanî işaret kir û gotin domand:
«Neviyên hevalê me Simko hene. Ew baş dizane ku bi firêxistina zarokan çendî dijwar e. Vî hevalî bi vê yextyariya

xwe dev ji mal û milkan, jin û zarokan û temamê
hogir û dostan berdaye û ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê
şer dike. Ew ji eşîra Simkoyê ku xiyanet bi kurdan
32
re kiribû. Eşîra Şikakan bi nav û deng e. Gerek tu zanibî.
Ya exî, qos qoce nîvê bajarekî Kurdistana Îranê ê wî ye;
dev ji hemî berdaye û apê min jî tew ji me re hîn behsa
çend terîş erdkê xwe dike. Hevalê Simko, de ka tu hinekî
qala maldariya xwe ji civatê re bike.»
Simkoyê şikakî li gora pîrekên kurdan, têra xwe emir
kiribû. Bi ser pêncî ne ketibû. Lê mîna kalekî heftê salî
xuyanî dikir. Çermê ruyê wî ê kişyayî di bin çenê de li hev
qulipîbû û qatqatî daliqiyabû. Ji çend diranên wî ên pêşî
diran di dev de ne mabûn. Movikên argûşka wî a jêr tam
bel bûbûn; argûşk dişibiya tifikên toriyan. Gava dipeyivî
kufîniya marekî ji dev dihat. Zirav î dirêj bû. Porê wî heta
bi jora cênîkan weşiyabû. Patika serê wî ji pare mîna qesebê
dibiriqand. Simbêlên wî ên gewr û boz bi rîha wî a
kişyayî re bûbûn yek. Hinarkên rû bi zor xuyanî dikirin.
Çav û biruyan li hev ne dikirin. Çav sor û hûrik û birhû jî
mîna xetên terektorê qalind û dirêj bûn. Ji nenûkên wî ên
xerimî û qilêrî, gengeşiya rîh û simbêlan, mijankên şilek û
şelêqî û bivila wî a ku wek nikilê teyrekî kişiyabû, xuya
dikir ku destê xwe ji dinyayê şûştibû. Mirov digot qey bi
zikêşê bû, her ji bêhnikekê bi nava xwe digirt û ji nişkê ve
kil dibû. Ev mirovê ku ji kul û derdên dinyayê keşmûrkî li
hindurê qesra Circîs rûniştibû û ha ha diponijî, mîna ku
dizanîbû wê Gebro ew bi tena serê wî bişanda ser qereqola

Tinatê, eskeran serê wî jê bikira û dû re jî partiyê sûretên wî ên digel Reyis, bi kuç û kolanên temamê bajarên rohilatê welêt ve daliqandana û wek qehremanekî herî mezin li ser binivîsandana.
Simkoyê ku di wextekî de dîn û îmana xwe ji partiyê nas dikir û niha jî ew mîna dînazorekî didît, bi dengekî
33
fetisî:
«Wisa ye heval, wisa ye» got, xwêzî di qirikê de ma û serê xwe berda ber xwe.
Gebro xwe aciz kir. Lê di aciziya wî de hestekî insanî xuya nekir. Ruyê xwe ê bêmirûz xurand. Dû re jî bi bêvila xwe re devê xwe firkand, destê xwe ji ser bêvilê ranekir û bi dizîka di ber xwe de got:
«Wilo xuyaye ku divê seetekê berî seetekê em xwe bigihînin geliyên Tinatê. Ev xayin dikare bireve û eskeran bîne me.»
Wê hîn bigota lê dengê ku ji xaniyên jêr dihat hişê wî belav kir. Li wî dengî guhdarî kir. Zarokek digiriya. Dêya wî jî ew haş dikir. Lê ji zarokê bêhtir wê dikir qîje wîj. Simkoyê şikakî ji malbata axan bû. Ew jî mîna gelek rîhsipiyên kurdan bi cezmê ketibû û berê xwe dabû newala Nesarayê. Lê hesabê wî ê sûkê û malê li hev derneketibû. Li gora ku wî digot, xwe li dengê def û zirneyê girtibû û li derboqa û erbaneyê rast hatibû. Ne li marîfeta gotinan, li dengê xweşkêş, metilyoz, çapilî û canbêzarên ku mejiyê wî diqdiqandibûn, guhdarî kiribû û bi ser rêyan ketibû. Partiyê xweş-ne xweş gotibû, ew ji bo xwe girîng ne dîtibû.

Dewleta tirkan xwîna miletê wî arastibû. Ne carekê û
du-sê caran, gelek caran miletê wî di xwînê de fetisandibû.
Li Koçgiriyê, Araratê, Palûyê û li gelek cihên din bi
deh hezaran piçûk û mezin di hindurê şikeftan de dabûn
ser hev û şewitandibûn. Li temamê dinyayê, heta bi kûçikan
jî navê wan hebû. Lêbelê dewleta tirkan, miletê wî bi
qasî kûçikan jî ne dîtibû. Kesî nikarîbû navê xwe bikira
Rizgo, Nêrgiz, Dîlan û Sîpan. Îcar ew nav li kûçikên xwe
dikirin. Welatê wî kiribûn baregeha zilm û zorê û bêwe-
34
stan agir li ser dibarandin. Û li gora wî, partiyê jî ew cenewar
dikuştin. Law û keçên ku ji xwîna wî bûn, di çiyayên
Kurdistanê de dil û kezeb û gurçikên xwe mîna derbên
topan bi kar dianîn û di eskeran werdikirin. Wilo fikirîbû.
Kêfa wî ji wekheviyê re hatibû. Qîma xwe bi wekheviyeke
biratî anîbû. Lê «li wekheviya pîsiyê qelibîbû.» Wilo
digot. Partiyê ji miletê wî zincîrek çêkiribû û wî jî nizanîbû
ku di vê zincîrê de xeleka herî rizyayî, gemar û lewitî
cinsê wî bi xwe bû. Xwe bi temtêla begên kurdan
girêdabû û derbasî meqamê partiyê bûbû. Nizanîbû ku
komunîstan wê şexsiyeta wî bişibandana cilên wî ên kurdane
û li gora şexsiyeta cilên xwe ên proleterane pê re
bimeşiyana û ew cil bişewitandana. Qutikê li ser ji çakêtê
li ser bêhtir bi qilêrî bû. Kiribûn wek qirdikekî. Bi pantorê
proleterî ji navikê û berjêr de dişibiya roviyên heşandî.
Bi kum û koloz çûbû newala Nesarayê. Koloz ji ser kum
kiribûn, stêreke sor bi kum ve zeliqandibûn, dabûn serî û
bi wî kumî li çol û çiyan digerandin. Bi ser de jî ji malbata

xwe hez dikir û girêdayê urf û adetên kurdan bû. Û ew yeka han jî bi partiyê re dijminatiya herî mezin bû. Nizanîbû ku disîplîn û terbiya partiyê berî hestên wî û şexsiyeta civaka wî dihat. Li akademiyê ew dabûn beşê «Buyuk Terbiye» û li dora salekê ew hînî terbiya partiyê kiribûn. Lê mîna ku ji tahtê re gotibûn, ketibû vî guhî û di guhê din re derketibû. Îcar ji a herî xerab yek jê jî ku hînî tirkî ne bûbû! «Qaçtî, qoydî, soqtî, ehmeq oxlî ehmeq, eşek oxlî eşek, orsipî çocixî, anasî soqaq qadinî, namûsiz ewladî, yalla yalla siktir ol!» û çend peyvikên mîna van hîn bûbû. Di serxwebûn û azadiya Kurdistanê de malbat, kelemê herî mezin bû; tiştê hatibû serê milet hemû jî ji destê mal-

35

batê bû. Mexlûqê herî pîs, dijminê herî mezin malbat bû! Kaniya xayinan, dayira bênamûsan, çala gû malbat bû! Bi çi haweyî diba bila biba, partî mecbûr bû ku xwe ji wî gûyî paqij bikira. Îdeologan ev terbiye dabûnê û mêrik jî bi terbiye ne bûbû.

Jina wî bi temamê kuflet ve xwe gihandibû Qamişlê û ji wir jî çûbû newala Nesarayê. Ne erza jina xwe şikenandibû û ne jî ew bêminet kiribû. Tew bi ser de jî lingê partiyê xistibû soleke teng. Jinikê partî mecbûr kiribû ku mêrê wê bişanda Qamişlê ba zarokan. Destûra şev û rojekê stendibû. Mêrik çûbû û bi ser de jî bi temamê kufletê xwe ve tam sê şevan di odeyekê de raketibûn. Li vegerê ew rast biribûn beşê «Buyuk Sevgî» û ew teslîmî çend tîmên partiyê kiribûn. Tîm jî di wextekî de îdeolog bûn. Neh-deh salan di Zindana Diyarbekirê de li ber xwe

dabûn, teslîm ne bûbûn û di êşkenceya vir de teslîm
bûbûn. Heta ku têla sincirî di qulika mîzoka Simko re derbas
ne kiribûn jî, li ber xwe dabû. Ma vî belengazî wê çi
bikira? Helbet ji bo ku xwe li ber êşkenceyên ecêb û ecêb
isbat bikira ne hatibû vir. Êşkence zor bû. Can li ber xwe
bida, mejî li ber xwe ne dida. Heger mejî li ber xwe bida,
vê carê jî can wê li ber xwe ne daba. Ne xwediyê ihtîqadekê
jî bû. Him jî ne di destên ereban û ne jî di destên tirkan
de bû ku xwe wek axayekî nandar bidîta û ji wan re
serî dananîba. Di dawiyê de ew jî mîna gelek kurdperwer
û «çekdarên ajan», di êşkencexaneyên partiyê de ji desthilanîn
ketibû. Di desthilanînketinê de xelasî dîtibû. Nizanîbû
ku li Rohilata Navîn jidesthilanînketin ya jî maqûliyeta
li himberî desthilatdaran her tim pîs bû û dawiya pîsiyê
jî her tim wê bi pîsiyê biqediya. Di nava bêexlaqiya
36
êşkenceyê de li xelasiya exlaqê xwe geriyabû û ji ber wê
yekê jî teslîm bûbû. Mîna Circîsê ku di êşkencexaneya
tûgayê de serî ji tîman re dananîbû, nizanîbû ku desthilanîn
‘fereca xêrê’ bû û bi liberxwedanê şexsiyeta mirov li
ser lingan dima. Dawiya teslîmiyetê malwêranî, bêşexsiyetî,
xwefiroşî û dû re jî kuştin bû. Bi yekê ji van jî nizanîbû.
Piştî teslîmiyeta wî, bar li ser bêr lê kiribûn; bi hefsarê
wî girtibûn û berê wî dabûn kaş û xiraman.
Dewleta Îranê û Tirkiyê ew ji bo kuştina Reyis û çend
komutanên wî ên sereke şandibûn newala Nesarayê.
Kuştina du komutanên ku di çiyayê Gebarê de ji xafil de
hatibûn kuştin, qebûl kiribû. Tonek sirên partiyê gihandibûn

dewleta Tirkiyê. Û ewqas jî ragihandibûn a Îranê. Bi mixaberatên Sûriyê re ketibû têkiliyê û cihê sekna Reyis di ber sed hezar dolarî de ji wan re gotibû. Ajanên Mosadê ew li ser rêya Qamişlê zeft kiribûn û mala Reyis a li Şamê ji wan re heşkere kiribû. Û him jî bê pere. Ev sûcekî din bû. Ji aliyê exlaqî ve xwe behdilandibû. Li pêş keç û lawên xwe ên xort û bûka xwe, bi jina xwe re razabû. Mîna kûçikan reyabû, mîna pisîkan niriyabû, mîna keran ziriyabû, kiribû nûze nûz û xwe avêtibû lingên tîmên êşkenceyê, hakim û sawciyên partiyê. Di dawiyê de idam dabûnê û ewraqên wî rêyî «Ûlû Halk Mahkemesî» kiribûn. Ev hemû ji Circîs re gotibûn. Lêbelê Reyis wek melekê rehmê derketibû pêşiyê. Piştî ku bi hev re, li gotinên wî ên li ber kamerayê guhdarî kiribû, «ez te efû dikim; de here tu jî hejêkirina xwe a li himberî min isbat bike», gotibû û bi ser de jî sûretê xwe pê re kişandibû. Dilê wî fireh bûbû û ji kêfan re giriyabû; ew ji pêxeberekî jî mezintir dîtibû û lingên wî maçî kiribûn. Li ba wî êdî partî ne

37

tiştek, Reyis her tişt bû. Birêvebir cenewar, Reyis insan bû. Ew him per û bask û him jî stûna hindurê kurdan bû. Jiyan û mirin, hebûn û nebûna kurdan hemû jî bi Reyis hebû. Reyis bimira, miletê kurd dimir. Reyis heba kurd hebûn. Reyis neba, wey li halê kurdan! Ocaxa wan ditefiya û her tişt têk diçû. Wilo ketibû serê vî Simkoyê reben. Hîn jî wilo difikirî.

Circîsê ku dilê wî bi Simko re bû, xwe xist şûna Simko û bi Gebro re wek xwe peyivî:

«Rast e, mirovên herî maqûl û heta ên herî jîr û zana di
nav we de ne. Lê ma li ber çi ne? Hîç. Mirovên ku dev ji
jin û zarokên xwe, mal û milkê xwe qeriyane û xwe sipartine
we pir in. Lê we çi qîmet daye wan? Û ne bi qasî serê
derziyê jî. Zir miletekî xwe sipart we û we jî ew deverû
bire erdê. Me ji vî şerî çi fêhm kir? Me çi bi ser xist? Çi
kete destê me? We miletek kire ber destan, miletek kete
ber lingên tirko. We kerrê me li korê me gerand. Me dijminahiya
xwe bi xwe ji bîra kiribû, lê we li me rast kir. We
destê xwe dirêjî nav me kir û we bêvila xwe di her derê me
rakir. We agir bera nav me da. Hin ji me bûn pîber, hin bûn
yûrdserver, hin bûn xayin, hin bûn sorimlî, hin bûn
başqan, hin bûn ardimcî, hin bûn proler, hin bûn qadin
heqî û bazdan ser adem heqî. Kuro, we jin kir mêr û mêr
jî kir jin û we jin berda ser mêr, mêr! Hin ji me bûn fewedal,
qominîst, faşîst, mixbirçî, cahş û ajan û me dada hev.
Her yekî ji me kevir di gûyê xwe werkir û me bi pêsêra
hev girt. Bi saya serê we, me hevdu behdiland. Kûçik bê
çî ye êdî nema nan ji destê me digire. Heta bi toltajiyên ber
devê deriyê mehkemeyan jî ji me re difîkînin! We konê me
ji nav konan rakir û we agir bi stûnên me danî!» Bi tepan
38
li sênga xwe xist: «Wey li minê! Me asasê xwe li ser berfê
lêkiribû. Hoooweh, ewqas keda me bertelef çû! Ewqas
xwîna me bi erdê de çû, ewqas!...»
Niyeta Circîs û seknê tune bû. Di dawiyê de Gebroyê
ku di ber re dilop dikirin, serê xwe wek ê mêr dirêj kir û
herdu destên xwe hejandin:

«Me bi vî şerî çawa çi fêhm kir û çi bi dest xist! Me her tişt fêhm kir, bi ser xist û xist destê xwe:
Partiyê miletê kurd ji mirinê rakir. Ruh dayê, ew hînî kurdayetiyê kir û derxist qada tarîxê. Kurdên ku bûbûn wek mirîşkan, partiyê ew kirin şêr. Fesad bûn, fesadî ji nav wan rakir. Cahil bûn, ew zana kirin. Bawerî bi hev ne dianîn, bawermendî da wan. Hevdu dikuştin, kuştin ji nav wan hilanî. Xayin bûn, muxbir bûn, serhişk bûn, ma çi û ne çi bûn! Partiyê ew kirin wek rûnê hilandî. Ku dibêje me bi vî şerî çi bi dest xist! Bi şer, me kurd gihandin ser hev û me dijminên wî pê dan nas kirin. Me kurd kirin yek!»
Circîs nema xwe girt:
«Weh çawa, tirrr kurd kirin yek! Kuro ev hûn gotinan wilo dikin ku aqilê mirov bisekine. Lê ji ber ku em jî kurd in, gotin û kirinên we ewqasî bi me ecêb nayên.»
Di rastiya xwe de ne wan kurd kiribûn yek û ne jî kurd bi xwe bûbûn yek. Digel ku her kesî her tim zilmeke pir pîs ji destê dewletê yan jî esker û polîsan dikişand, nêzîkî hev ne bûbûn. Car carê gava ku nêzîkî hev bûbûn jî, tiştek ne xistibûn serê hev û her kesî wek xwe kiribû.
Gebro guh neda Circîs; xwe lê berda û bi nav de çû:
«Ev kurd miletekî ewqasî ketîbû, welatê xwe nas ne dikirin, welat!! Heta bi navê Kurdistanê jî ji bîr kiribûn, exî! Me çiya ji eskeran safî kir, çiya! Bi şev esker ji ber me
39
newêrin xwe ji qereqolên xwe berdin!»
Circîsê ku ji pîrekan jî bêhtir xwedî exlaqekî kurdî bû, jê hatibû bêvilê. Ruyê wî reşxeriqîbû. Pê dizanîbû ku

mirovekî derewîn û pivikî ye. Lê kula herî mezin ku dabû ser dilê wî, ev mirovê çist him biraziyê wî bû û him jî vî birazî tuxmê bûblaniyan lewitandibû. Li gora wî, bûblanî tuxumşamî, girs û dirêj û lihevhatî bûn. Ji ber fedî dikir. Bi qasî ku ji Reyis dihenitand, wilo jî jê dihenitand. Heger têketa zefta wî, ji ber bûblantiya wî jî maba, av lê venedixwar. Circîs devê xwe dagirt, vala berda û fikirî:

Ez çima xwe dikim hevalê vî kerê çolê? Ma bi min dikeve? Na. Bi ên din re bipeyive. Dibe ku te fêhm bikin. Na, fêhm bikin jî xêr nake. Ew ne li ber tiştekî ne. Di civata wan de cihê mirovên zana û ji xwefedî, nav şekalan û ên wek vî biraziyê minê ê ku ne hêjaye pîvazekê jî ser doşekê ye. Ev çima wilo dikin? Her kes dizane ku sermiyantî bi zarok û tewtewan nabe. Şivan û gavan nikarin bibin mezinê gundiyan û civata wan bi rê ve bibin. Beqal û şeqal çawa dikarin bibin mezinên bajariyên karmend û karker! Dû re jî:

«Kuro lawo ev tu çawa general î! Tu kirasê nedirûtî li civatekê dikî. Li miriyan derew dibin, li zindiyan derew nabin», got û xwe paş de vekişand.

Wî fêhm ne kir. Circîs bi nefêhmkirina wî hayî bû. Vê carê jî xwest bibêje ku tu li ruyê me dinere û tu derewan li me dikî. Ji ber xwe û civatê fedî kir, wekî din got:

«Heger esker bi şev newêribin derkevin çiyê, em jî bi roj ji ber eskeran, çiyê li wê navê bihêle, newêrin ji gundê xwe derkevin. Mela Mistefa Berzanî bi temamê xelkê xwe

40

ve di çiyan de bû û ordiyên ereban ji tirsa wî newêrîbûn li

çiyan bineriyana. Erê ev partiya te jî, çima wek wî bazê çiyayên Kurdistanê, topên ku teyaran dixînin peyde nake?» Ji fuzeyan re digot. «Di çiyan de erz û eyalên me bistirînin û ez ê bi vê yextyariya xwe bi şev û rojê ji we re xulamtiyê bikim. Lê hûn jî mîna eskeran me ji welatê me dikin û me bi nav tirkan de dişînin.»
Salihê ku guhên wî mîna şaqûla bin mêwê rep sekinîbûn, ji dera han:
«Kalo, partiyê gelek tiştên bi marksîzmiyeke qerase kirine» got, ji ber gotina xwe fedî kir û hema pê re jî serê xwe berda ber xwe.
Vî zilamî mîna ku bi wan re mêr kuştibûn, hîç ne dixwest wan aciz bike. Ev neviyê Circîs jî yekî wilo bû, zû fêhm dikir lê nizanîbû bigota. Çekdaran kitêbkeke bi navê Marksîzm çî ye? dabûnê û wî jî her tim dixwend. Reyis kitêb nivîsandibû. Mêrik bi ser de jî mêrê sê jinan bû. Keçeke Cidhên, yek Hesûk û xuşkeke Serdêr li ba bû. Di eslê xwe de zewaca wî ne ji ber ku kêfa wî ewqasî ji jinan re dihat bi sê jinan re zewicîbû, Circîs û temamê malbatê a xwe li wî û Faro kiribûn yek û bi darê zorê jin xistibûn stuyê wan. Tew ên Faroyê lawê Hesûk çar bûn. Li herêmê heta bi zilamên navser û pîr jî hema hema bûbûn xwediyê du-sê jinan.
Piştî ku Selîm got «bêguman partiyê gelek tiştên hêja kirine, lê gelek tiştên xerab jî kirine», Circîs bi xwe ne xweş anî:
«Çi tiştên hêja kirine, bavê mino! Rast e, em gihandin hev. Ew jî bi fen û fûtan. Û dû re jî agir berdan me. Îcar

piştî ku tiştek di me û van rebenkên binxetiyan de ne
41
hiştin, vê carê jî berê xwe dan berzaniyan û li wir bi goştê
canê xwe hilketin...»
Gebro heta vir jî ewqasî ji Circîs aciz ne bûbû. Bi lez
destê xwe avêt tûrikê xwe û kitêbkek ku ji kovara partiyê
pêk hatibû, derxist. Navê kitêbê «Emperyalîst Ûşagi» bû.
Sûretê Berzanî li ser herdu aliyên wê xistibûn. Ecemîtiya
îdeologan bi haweyekî vekirî di sûretan de xuyanî dikir.
Berzanî li ser qantireke reş kiribûn û çifteyek dulûle xistibûn
destê wî. Li ser bergê paşî jî stuyê wî li ber Şah xwar
kiribûn û Şah jî herwiha pê dikeniya.
«Binere bê Reyis di vê kitêba xwe de ji bo Berzaniyê
te ê ku zilamê emperyalîst û siyonîstan bû çi dibêje. Guh
bide min», got û çavên xwe li gotinên herî lewitî gerandin.
Circîs bi tarîxa sed sala derbasbûyî baş dizanîbû. Ji
tiştên ku dîtibûn û jê re hatibûn gotin, tiştek ji bîra ne kiribû.
Û bi ser de jî hîn di dewra telebeyan de fêr bûbû ku
emperyalîst emerîkî û siyonîst jî cihû ne.
Peyivî û kefê di dev re avêt:
«Cihû ji te û bavê te û temamê sûlala te çêtir in! Ew
dijminên dijminê me ne. Tiştê ku ji destê wan hat ji bo
Berzanî kirin. Ew ronahiya çavên me ne. Serê we mezin e
lê vala ye. Mejiyê we heye lê aqil tê de tuneye. Ma dîsa ne
ew cihû bûn ku berî her kesî bi kurdan ve hatin. Xelkê me
ê başûrê welêt ji ber agirê erebên we direviyan û wan seryonîst-
cihû û peryalîstan jî bi gemiyan cil û xwarin ji wan
re dikişandin.»

«Lê ew cihûyên ku tu wan ronahiya çavên xwe dibînî, ji aliyê din ve jî zilmê li mezlûmên wek filistîniyan dikin. Ma dibe? Mirovên zalim nabin dostên bindestan. Ne dostên kurdan e.»

42

«Helbet ez ne hevalê wê zilma wa me, pir ne baş dikin. Kê zilm bikira, gerek wan ne kiriba. Di dinyayê de pêşî wan û dû re jî me kurmancan pir kişandiye. Ji her miletî bêhtir gerek wan bizanibûya bê hêsîrî, girtin û kuştin çiqasî zor e! Zilm bi wan nakeve. Ez bi vê yekê ne bi wan re me. Xwe pê pir pîs dikin!...»

Gebro gotina wî birî:

«Apo, de ka hinekî rê bide min bê kitêb çi dibêje», got û xwest dest bi xwendinê bike.

Circîsê ku di vê bêhnikê de dilê wî bi agirê bîranînan diqijqijî, rabû ser kaban û vê carê jî herdu destên xwe bi ser de hejandin:

«Dev jê berde, li cihê xwe rûne û devê xwe bigire! Ez ne ew ê ku li çîrokan guhdarî bikim. Hewcedariya min bi xwendinê tuneye. Tiştê ku min dîtiye, min bihîstiye û bi serê min hatiye di kitêban de tuneye. Berzanî taca serê me ye û hew!»

Gebro mîna ku henekên xwe pê bike bişirand. Dû re jî mezin peyivî:

«Bi rastî jî wek ku serok Reyis dibêje, ev kurd miletekî pir duşurulmîş bûye! Hîn jî Berzanî nas ne kirine, yaho!» Newêrîbû jê re xayin bigota. Dizanîbû wê Circîs xwe têwerkira. «Berzanî hevalê Şah bû û ji Şah topên li

himberî teyaran distendin. Erzaqên xwe jî. Lê ê me, bêyî ku em zilamtiya hinekan bikin, me bi qeweta zend û bendên xwe çiyayê Araratê, Cûdî û Gebarê tije top kirine.
Teyare newêrin di ser wir re bifirin. Me hindik teyare li wan çiyan ne xistin; me li wan deran hindik eskerên tirko ne kuştin. Me li wan deran tam sê cumhûriyetên kurdistanî ava kirine û hîn jî apê min Circîs pê ne hisiyaye, exî. Pê
43
hisiyaye lê li hesabê wî nayê.»
Hemîdoyê pîr, xwe xist taldeya emrê xwe û tecrûbeya xwe derxist pêş:
«Circîsê me rast dibêje, lawê min. Mirov nikare Reyisê we bi de ber Berzanî.»
Agir ketibû çekdarê wanî. Ji nişkê ve gotina wî qut kir, wek mitirbê ku xwe biavêje ser cêza genim, çongekî xwe hilda û yek danî, serê xwe ricifand û herdu destên xwe tîtikî di erdê de çikandin:
«Na heval, Reyis her tişt olûştûrmîş kir. Reyis em kirin insan. Reyis kişîlik da me. Miletê kurd ceset bû û ew jî bû ruhê wî; em hemû ji yoktanê yaratmîş kirin û ji sifrê dest pê kir...»
Li hesabê Circîs ne hat:
«Lawê bavê min, hêdî hêdî, tu di civata zilaman de rûniştiyî» got û li dê û bavê wî fikirî:
Weled weled, kudko kudko, bê çi guneh e. Xwedê dizane bê niha dê û bavê wî di çi qiriktaliyê de ew mezin kirine. Miheqeq ew şandine mektebeyan jî. Lê na na, ez bawer nakim. Mirovekî xwenda nikare van gotinên tirovirî

bike. Çawa nikare bike! Pîstir jî dikare. Ma te ên wilo gelek ne dîtin? Belê. Tu li gora Reşo û Serdêr li meselê dinerî, ezbenî. Ew li ber destên te û Heso mezin bûbûn. Rast e. Mirovê ku exlaqê kurdan û terbiya wan ne girtibe, sed mekteb xwendibe jî nikare hêviyan ji xwe bike. Ê nisêbînî bi dê û bav kurd bû, li nav tirkan mezin bûbû û bi ser de jî du-sê mektebeyên bilind xwendibûn. Lê mêrikê ku ew jî bûbû mezinekî van ên rûniştî, mîna eskeran bi me re dipeyivî. Tu ferqa wî û van ji hev tune bû. Zilamê gava ku xwe li mezinahiya civatê şidand, divê mektebeya civa-

44

tê xwendibe. Bi zimanê civatê, exlaqê civatê, rabûn û rûniştina civatê zanibe. Lê yekî ji van ev mekteb ne xwendiye û bûne mezinên me jî, kuro. Waweyzê, yek ji wan jî bîra dinyayê nabe, ma wilo dibe?

Çiqasî fikirî ewqasî jî mahdê wî ne xweş bû.

Lêbelê piştî ku ê wanî got «Reyis, em kurd ji tunebûyinê çêkirin. Em sifir bûn. Em ne tiştek bûn. Kişîlik da me», Circîs fetiqî û bi hişim peyivî:

«Lahewlelwela, erê kuro, Xwedê Adem ji heriyê çêkir û wî Reyisê qinyata dilê we jî em ji gû û rêxê çêkirin! Îcar te fêhm kir bavê mino, şoreşgero?»

Civat sar bû û hilmekê bê deng sekinî. Xortê duhokî piştî ku li hevalên xwe nerî û tu hêviya bersivê di wan de ne dît, xwe nepixand:

«Apê Circîs, tu neheqiyê li gelê kurd û serokê temamê Kurdistanê dikî. Wisa xuyaye ku hayê te ji dinyayê nîne», got û hema pê re jî serê xwe berda ber xwe.

Circîs ji jêr de lê nerî, destê xwe ê rastê baş bilind kir
û hejand:
«Tew, de îcar ji xwe re li vî alimê tûrik binerin bê ji
min re çi dibêje(!) Baş e, ser çavan. Lêbelê ev tu ji vî
mirovê ku tiştekî ji dinyayê fêhm nake re, nabêjî bê gelo
ji bo çi dewleta tirkan bi Sûriyê re deng nakî, hi? Ordiyên
wan li dera ha bihêlin, kolordiya Diyarbekirê dikare temamê
Erebistanê fetih bike. Îcar ev tirkên ku devê me û hevt
sed bavê me diçirînin, zirtekê bê çî ye li erebekî nakin!»
Mîna ku qijnikan bi stuyê Simko girtibûn, stû bizîviranda
wê devlê kiribanayê. Xwe bi carekê ve zîvirand,
çavên xwe kutkutandin û bi teqil peyivî:
«Ezbenî, Reyis mirovekî pir û pir mezin e!! Heta bi
45
Emerîkayê jî naçe devê hespê wî. Tirk ji tirsa wî re newêrin
bi Sûriyê re deng bikin. Ji tirsa wî heta bi melayên
Îranê jî li himberî me kurdan sist bûne. Piştî ku heval hatin
Kurdistana Îranê û...»
Circîs mîna ku xewneke ne xweş bibîne veciniqî:
«Te got çi bavikê mino! Mêrikan çûn wir jî ha!...»
Ehmed fêhm kir ku wê Circîs bide nav. Li çekdaran
nerî û bi qasî ku Gebro hemî fêhm neke, pê re hinekî sergirtî
peyivî:
«Ez xulam, agir ketiye dawa me. Bêhna xwe fireh bike.
Hewce nake em jî vî agirî tev bidin.»
Circîs gava ku ji rastiya meseleyan fêhm dikir û ew
rastî ji ên li derdora xwe re negota, xwe kêm didît. Germa
germa bersiva wî da:

«Bêdengiya li himberî kod bi qulan, malê diviritîne.
Wê wir jî xerab bikin. Divê mirov bi haweyekî xwe bigihîne
wan. Ew jî kurmanc in û ji xwîna me ne.»
«Çû çû, piştî ku hasil giha Mûsil, ha!»
«Rast e, her tişt beravêtî bûye.»
«Îcar çi, ma dibe mirov bi nexê dû şûjinê dakeve?»
«Ew jî rast e, heger me ji aliyê qûnê ve lê nenerîba, wê
nex jî îro li nav lingên me ne geriyaba, hi?»
«Belê belê, wilo ye. Lê nex ji xwe li ber tavê dişewite
û li ber baranê jî dirize. Guh nedêyê, çavên min.»
Circîs keniya. Kenê wî dişibiya îske îska pîrekên ser
mezel.
«Howeh li vê ecêbê! Keda me bû xura miriyan!»
«Lo bira lo! Karê me kurmancan ev e, me her tim bê
ser û çav daye nav.»
Circîs vê carê jî axîn kire xwîn û bi hêdîka li sênga xwe
46
xist:
«Wey li minê, çawa kesî ji me bîr nebir ku ev şer di
rojekê de wê biqulipiya şerê xal û xwarziyan!»
Her kes sekinîbû û li van herdu pîrên ku felsefeya
zimanê kurdî bi kar dianîn, temaşe dikirin. Ji bilî çekdaran
her kesî fêhm dikir. Simko jî di wan gihabû.
«Apên me jî gotinan wilo dibêjin ku mirov hîç fêhm
neke», Gebro got û li bin zikê qesrê nerî. Tiştek jî bi zikê
qesrê ve tunebû.
Circîs keserek kişand. Dû re jî bi zirt:
«Ji xwe ferqa me û we jî ev e!»

Ehmed fêhm kir ku Circîs biryara xwe daye, kî çi
bibêje wê fêde neke û ji mala xwe çekdaran biqewirîne.
Da aqilê xwe û bi haweyê ku çekdar bêdilmanî gund terk
bikin peyivî:
«Qomandar, ew teredînê Cidhankê me ne ji xêrê re bi
xwe re bir. Ew baş pê dizane ku mêrik çendî xerabe ye. Li
Hûto çûye, gotin xwe pê re nagire. Ewqasî ehmeq e ku
nabêje wileh gava ez li çekdaran mikur bêm, wê qomandar
bi eskerên xwe ve li gund vegere û me hemiyan bi ser
hev de bikujin.»
Bi gotina wî re çekdaran xaşomaşî li hev nerîn û di cihê
xwe de bûn hêlan. Mirov digot qey li ser stiriyan rûniştîbûn,
qûna wan erd ne digirt. Keft û lepta wan ji çavên
rîhsipiyan ne reviya. Ji rîhsipiyan, Osmên xwe avêt ber
tenûra Ehmed û lepek ardûyê din di tenûrê werkir:
«Erê kuro, qaşo wê ji min re çend serî lehane bikiriyana(!)
Îcar yarê gonê çûbû xes kirîbûn. Xes kuro, xes! Zilamê
gava ku hîn nikaribe lehane û xesan ji hev nas bike, ma
wê çi û çi neke, lo! Bi telaq hema ji niha û çend mişarekî
47
din, wê Cidhano heta bi kolordiya Diyarbekirê jî bîne ser
me.»
Vê carê jî rîhsipiyekî ji qorziya qesrê, bêyî ku bikene,
xwe avêt pişt û tam li çekdaran şidand:
«Oso, ma bi tenê hew ewk. Mêrik bêexlaq e jî, kuro!
Ma nayê bîra we gava ku bê jin mabû, dabû dû qûna
Hemîdê bajarî, diçûn xanê, bi pereyan ker berdidan ser
hev û ji xwe re li nîhandinên keran dinerîn...»

Hesûk bişirand û bi qerf got:
«Bavo we eyarê birakê min ê çeqçeqonkî tije pûş kir. Wilehî ewqasî jî nabe. Rastgoyî, li wê bejin û bala wî a lihevhatî û wî ruyê wî ê sipehî pir dixwe, yaho. Îcar çi hûn henekê xwe pê dikin. Ha, tew ma çima hûn vê nabêjin: Ma ne li ser qelenê jina ku wê ji xwe re bianiya jî bi qumarê lîstibû, ha!»
Mîrzoyê Mitirb bi devlikenî pê re dêrand:
«Erê kuro, hey tê de hato, lawo Hemîdo pîrekî ku tir tê ne mabû, mirov fêhm dike lo. Îcar ê me», got û vê carê jî berê xwe da Perîxanê:
«Baş e ku mirov ji pîra dêya wî bipirse: Pîrê, ma lawê te bira wilo xerab e bû?»
«Lawo wilehî ez çi bibêjim, bavê wî qeraseyekî zilaman bû, ez ji ber ketibûm qelaqê...»
Circîs keniya. Lêbelê tiştek jî ne got.
Qisûra vî Cidhanî yek jê jî ew bû ku bi cara pêşî re hînî tiştan nebûya, zû bi zû nema hîn dibû. Tirkiya wî jî wilo bû. Li dibistanê bi cara pêşî re ji tîpa K re Q gotibû û heta bi dawiyê wilo mabû. Rîha wî sipî bûbû û hîn jî Kyên bi tirkî wek Q dixwendin. Mamoste rojekê ji dînê xwe derketibû, rahiştibû çûkekî beytik, li dor seetekê pê re rûnişti-
48
bû û ha ha gotibû «ewladim, kûş, kûş, kûştûr bû!» û wî jî herwiha gotibû «qûştûr ogretmenîm.»
Circîs li sênga xwe dixist û dibiland:
«Çewalekî zibil e û ketiye stuyê min!»
Mala wî viritandibû. Bi rastî jî hin tiştin ku divabû hîç

li hev ne kiribana li ser vî mirovî hebûn. Ferzek limêj li xwe derbas ne dikir, tu carî rojiya xwe ne dixwar, her rojên înan xwarina miriyan derdixist, diçû ser mezel û yasîn li wan dixwend û selewat didan. Û gava berê wî diket Mêrdînê û Diyarbekirê û keys lê dianî, diçû kerxaneyê jî. Derew û fesadî li ba tune bûn. Qumarçiyekî wilo bû ku tu carî ji kesî ne dibir. Her tim dixesirî. Circîs car carê bi berstika wî digirt û bi ser de diqêriya:
«Erê kuro lawo tu pereyan ji xelkê nabî, îcar ev çima tu perekên li ser xwe ji xwe de dixînî!...» Dû re jî wê bigota, «bi telaq dewlet jî bavê vî be, wê nikaribe ji bin barê wî derkeve, weh! Bavo wilehî wê dewlet top biavêje!»
Bi ser de jî yekî heta mirov bêje bes, çavfireh û dilbirehm bû. Nanek û gayek li ba wî wek hev bû. Temamê feqîr û parsekên Nisêbînê ew nas dikirin. Parsekan di nav xwe de li hev kiribûn û her roj bi dorê çavdêrî li ser rêya Zorava dikirin. Li Meyroya dêya Reşo hatibû; nizanîbû bigota «na.» Îcar gava pere pê re tunebana jî, li ser zadê şîn deyn dikir û parsek dibirin aşxaneyê. Her sal pişkek bêndera Circîs, li deynên wî ên ku di ber feqîr û fûqaran de kiribûn, diçû. Di eslê xwe de a ku Circîs tam ji dînê wî derdixist ew bû ku Cidhên, car carê di paqijkirina axuran de alîkariya pîrekan dikir. Ser dev û ruyê mêrik tije tif dikir û jê re digot:
«Erê lawê berêz, ma dibe ku mirov bi wan zir simbêlan
49
gû û rêxê belav bike! Qe hema simbêlan jê ke, te hetka zilaman anî kuro!»

Civatê bi dahbeloriya Cidhên li çekdaran teng kiribû.
Lê Loqoyê lêvçiryayî ji nişkê ve her tişt şeg û peg kir.
Mîna roviyê ku mirov jê re difîkand, stuyê xwe dirêj kir,
li dora xwe nerî û tiştekî ku tu elaqa wê bi mijarê re tune
bû got:
«Ez bawer dikim ku heval vê yekê jî dizanin. Ez pir
mereq dikim:
Gelo ev çima ji Zorava Nisêbînê xuya dike û ji
Nisêbînê Zorava xuya nake?»
A xuyakirinê xuya dikir, lê wî bîra ku biçûya ser minara
Zeynelabidîn ne dibir.
Xortê wanî xwe bi ser hev de zewirand û kulma xwe
rakir. Piştî ku got «bijî Reyis!» xwe li bersiva Loqo
şidand:
«Li gorî bilîmê Albert Eînsteîn, ji alçaqê temamê yuksekê
xuya dike. Lê ji yuksekê temamê alçaqê xuya nake.
Zorava di cihekî alçaq de ye, ev e qonî.»
Eînsteîn ne bes bû, tew mêrik Zorava jî da ser. Her kesî
dizanîbû ku Zorava raserî Nisêbînê bû. Ji Circîs qeherîbû
îcar kerba xwe di serê gund re derdixist. Mesele ev bû.
Bersiva wî ne ket serê Mîrzo. Ji telebeyan hîn bûbû ku
'alçaq' tiştekî pîs e, lê çiqasî pîs bû nizanîbû.
Beşişî:
«Errek! Ev Erştay çi zilamekî mezin e, kuro! Bê kê
bîra ku Zorava alçaq e dibir, yaho!»
Dû re jî berê xwe da Loqo:
«Rehmetiyê apê Xelef ne ewqasî alim bû, tu li kê çûyî?
Bi telaq te civat mîna qazîmazî qilopazî kir!»

50
Civata ku dest bi ken kiribû, tam keniya. Çekdar jî di qazîmazî de asê bûbûn û hişê xwe berdabûn ser bê ev qazîmazî ruhberekî çawa ye.
Di eslê xwe de ev Loqo heta ku jin ne anîbû jî mirovekî têra xwe bi aqil bû. Tarîxa bêaqiliya wî bi zewaca wî re dest pê kiribû. Jinikê malik lê viritandibû. Keça Cemşîd bû. Binkiraskê wê jî mîna sertaziyê Circîs ji kîsên genim bû. Dewletê genim bi hesabê bizir dida gundiyan. Kîs çapanî bûn. Circîs gelek jin û mêr hînî lixwekirina van kîsan kiribû. Bi kurtî, xanim di şeva bûkaniya xwe de, bi vî binkiraskê xwe ê ku ji zengelorka qirika wê dest pê dikir û heta ku digiha tilîkên lingên wê, xwe li ser livînan serpiştkî vedizilîne. Bûk li bendî zavê ye. Û xipşê bi ser de jî lempe hûr kiriye. Zaveyê reben jî çawa ku derî vedike, wilo jî bi qêrîn, «haho mirî rabûn!» dibêje û bêserî bazdide. Lê bi bazdana xwe re vê carê jî lêva xwe li tevşoyê ku bi stûna nîvê hindur ve daliqyayî ve bû dixîne û li erdê vedizile. Tevşo lêva wî a jorê li ser movikekê çirandibû. Lêvê dengê wî guhertibû.
«Heger jinik, piştî ku zave dikeve hindur û wê vezilandî dibîne raba ser xwe û bipeyivya, dibû ku ziravê Loqo ne qetiyaba û hişê xwe bernedaba», doktorekî çekdaran ji bavê wî re wilo gotibû.
Vî lawikê wanî jî dema ku xwe berda newala Nesarayê, bîst û çar salî bû û fakûlteya hiqûqê qedandibû. Yekî ku kêfa wî pir ji xwendinê re dihat û kitêbên ilmî ji xwe qut ne dikirin. Lê niha jî mirov digot qey mejiyê keran

xwariye.
Bi baholeke kitêb daket jêrê. Birêvebiran li Qamişlê kitêbên wî di cih de şewitandin û ew bi îdeologekî partiyê
51
re pazdeh rojan xistin xaniyekî. Îdeolog her roj tam heşt seetan ha ha «bijî Reyis! Bi xwîn, bi ruh, bi can, bi mal em bi te re ne ey Reyis!» pê da gotin. Dû re jî ew li akademiyê da beşê «Yuksek Bilîm»ê. Di hikmê salekê de temamê kitêbên Reyis wek avê ezber kirin û nîşana profesoriya ilmê Reyis ji destê Reyis bi xwe girt. Lê bi rastî jî gava ku hat û li hev ne hat, mirov çi bike jî li hev nayê. Mêrik şevekê di xew de ji wî ilmê xwe ê demekê ku bi roj ji bîra dikir, peyivî. Him jî li dora seetekê. Bi kurtî, Reyis xwe jê pir aciz kir, «here xwe isbat bike», got, sûretê xwe pê re girt û ew rast şand ba Gebro.
Civatê dev ji ken û henekan berdabû û li Mela Xelîl guhdarî dikir. Melê jî dîsa xwe dabû pişt Xwedê û li ser navê wî a di dilê xwe de digot:
«Ezzawecel selellahû wesellem, di ayeta Wetînî wezeytûnî de dibêje ku heta hûn kurmanc bi hev re ne bin tifaq, ez ê jî eskeran berdim ser dilê we û di hepsan Diyarbekirê de dara têxim we.»
Mîrzo li xwe qewimand:
«Seydayê delal, ji navê ayetê jî xuya dike ku Xwedê behsa zeytûnan kiriye» got û pirqînî lê ket.
Civatê jî da ber. Melayê ku di êşkencexaneyê de aqilê xwe berdabû sor û mor bû; heta ku jê hat destê xwe li erdê xist û bi deng got:

«De îcar ji xwe re lê binerin ku dibêje Xwedê behsa zeytûnan kiriye! Xwedê ji wê jî xerabtir gotiye, ehmeqo! Di ayeta bi navê El eskerul kafîrûnî de dibêje ku heta hûn kurmanc bi a hev nekin û eskeran nekujin, ez ê jî li tûgaya Mêrdînê tîman berdim ser jinên we!»
Circîs awir têfirandin û xwe zewirand:
52
«Mela mela, bavo tu xurifiyî, hêdî hêdî, ewqasî jî nabe, tiştin minasib bibêje, te her dever lewitand, weh!» Dû re jî wek zarokan bi herdu destan dev û ruyê xwe guvaşt, «here ser mezel û van ayetan ji Sarê re bixwîne», got û giriya.
Mela Xelîl dema ku sarinciyan a xwe bi eskeran re kirin yek û rahiştin sîlehan, bi xwe ne xweş anî û gotin bi muxtêr re kirin. Muxtêr jî tê hilda. Eskeran girtin ser malê û ew û jina wî rakirin tûgaya Mêrdînê. Li tûgayê piştî ku tîman herdu jî şilfîtazî kirin û li pêş çavên wî dest avêtin jina wî, dîn û har bû û serê xwe li dîwaran xist. Çar sal û heft meh û pênc rojan di girtîgeha Diyarbekirê de ma. Gebro bi hesabê ku dilê Circîs xweş bike, xwest mîna rîhsipiyan bipeyive. Lê heq jê derneket.
«Xwezî bi dilê yada Sarê û apê me Heso ku bi destên hevalên xayin hatin kuştin û bûn şehîdên Kurdistanê.»
Circîs hêrs bû:
«De îcar safî bikin, ne we dît bê çigot! Exlaqê van û romiyan yek e. Wek hev dikin û wek hev dibêjin. Qûncilik mîna keriyên berazan digirin ser gundan, malê xelkê talan dikin, xaniyên wan dişewitînin û dû re jî dibêjin,’biz koy aradî her tişt yolinde.’ Erê lo, navê şewt û talanê bûye

saxtîkirin. Heşkere heşkere mirovan ji malên wan derdixînin, li êşkencexaneyan dikujin û dibêjin ‘o adem qayîb oldî.’ De ji xwe re li vê bazarê binerin! Kuro ma adem morîk bû ku qayîb oldî, hi! Erê, navê girtin û kuştinê bûye winda. Ev ên me jî wilo dikin: ‘Nanê Îsa dixwin û selawatan li Mûsa tînin.’ Xelkê dikujin û dû re jî fatîhê li wan dixwînin.»

Gebro bi xwe zor anî:

«Apo tu pir pê li me dikî. Me tu kesê ku nanê wî xwa-

53

riye û ava wî vexwariye ne kuştiye...»

Mîrzoyê ku partî wek giyotînê û çekdar jî celadên wê didîtin, bêyî ku li hiner û tesîra gotinên xwe bifikire, kelgermî peyivî:

«Belê belê, apê Circîs rast dibêje. Hûn bi gur re dikujin û bi xwedî re jî şînê dikişînin. Ev karê we ye.»

Gebro hêrs bû û gotin li tahtê qeliband:

«Hinekî li ber devê xwe binere! Me bi gur re kî kuştiye ku tu van bêbextiyên ajanî li me dikî?»

Mîrzo çîz ne kir:

«Ma we kî û ne kî ne kuştiye û dû re jî hûn li ser wan ne giriyane, ezbenî!»

Gebroyê ku di wextekî de gundî li himberî wî diketin temenê, ji bîra kiribû ku zoravî ne ew gundiyên berê ne; esker li pişt wan sekinîne û gava ku bixwazin wê sed û bavekî jê çêbikin, çavên xwe beq kirin û dengê xwe bi ser ê wî xist:

«De ka bêje. Mesele?»

Bêtirs got:
«Mesele hema li Stilîlê: Gava ku me ji we re digot we ji bo çi ê stilîlî kuşt? We digot, ajan bû. Baş e, we ji bo çi zarokên wî ên hûrik kuştin? We got ku çêliyên maran bê jehr nabin. Erê, we çima jina wî kuşt? We digot, jina wî jî nifir li me dikirin. Îcar piştî demekê jî we got ku hin hevalên me ên ajan ew teresbavî kiribûn û partiyê ew bi kuştinê ceze kirin.»
Gebro wek axayê ku bi xulamê xwe re bipeyive:
«Ma ne eybe ji te re ku tu van derewan dikî?»
«Na, min tu derew ne kirine; ez tiştên ku min dîtine û min li we guhdarî kiriye dibêjim.»
54
Gebro ji ser xwe çû û peyva dawî kir:
«Tu pir zimanê xwe dirêj dikî, mitirb!»
Helbet gava ku ser bi seriyê bihata, Circîs wê a gundiyên xwe nedaba bi a çekdaran. Piştî vê gotina ku mêr li ser dihatin kuştin, êdî tu sebeb ne mabû ku Circîs kirasê xwe ne çiranda û xwe têwernekira. Kezeba wî anîbû xwarê. Û bi ser de jî di hindurê mala wî de erza dostê wî ê herî şêrîn şikenandibû. Mîrzo li gundê wî çêbûbû û mezin bûbû. Di rojên herî teng û xerab de pê re rabûbû û xwe tu carî jê qut ne kiribû. Ew bi lawên xwe ne dida. Mîna dozerê di cihê xwe de bilind bû, ket û qêriya:
«Ez beraz im, beraz! Tu lawê kîjan dolê yî ku tu di mala min de dikarî xwe biberizînî gundiyê min, hi? Berî ku ez kulekan di laşê we de vekim, biqeşitin! Zû ji mala min derkevin û hew!»

Xwîn li Gebroyê ku ne li bendî gotineke wilo bû, vemirî.
Mîna mirovê ku ji ber zelzelê bireve çeng bû devê derî;
lingekî xwe dirêjî derve kir û li paş xwe nerî:
«Hevalino, ji mala cahşan rabin ser xwe», got û meşiya.
Piştî ku Circîs jî wek wî peyivî, çekdarên rûniştî jî dan
xwe û hemiyan bi lez hindur terikandin. Aterikandinê terikandin,
lê wê bi ku derê de biçûna? Li herêmê gundekî ku
lê bistiriyana jî ne mabû. Bi tenê hew dikarîbûn xwe di
çiyan de veşartana, ewqas.
55
3
Atîllayê komutanê tabûra Nisêbînê, Cidhan çend rojekî
li tabûrê hişt û bi êşkenceyê da ser. Cidhanê ku kesî
hêviya liberxwedanê jê ne dikir, li ber xwe da. Yuzbaşî
çiqasî lê xist, wî jî ewqasî bawerî bi zilamtiya xwe anî û
devê xwe girt. Ew avêt felaqeyê, daliqand, li ser xuya kesmûkî
meşand, çixare bi laşê wî ve zeliqand, di devê wî de
mîzt, bi gunên wî girt û kişand û dîsa jî peyv ji devê wî
dernexist. Lê piştî ku li ser gotina mixbirçiyekî xwe destê
wî li Quranê xist û wî jî tiştê ku jê re lazim bû hemû gotin,
dev ji êşkenceyê berda û lêborîna xwe jê xwest. Xwe pê
şahîk kir û li dostaniya pê re geriya. Li meqamê xwe pê re
rûnişt û xwar û vexwar. Dû re jî ew berda û bi texsiyekê
rêyî gund kir. Piştî berdana wî bi çend rojekî, vê carê jî bi
çekdarekî ku bi her haweyê xwe teslîm bûbû û bi ser de jî
bi rojan di mala Circîs de mabû, hat gund. Vê carê wek
carên berê ne kir. Bêyî ku li hinan bide piçûk-mezin, maliyên
Circîs yekser derxistin ser bênderan û hindur û axur bi

carekê ve ji eskerên xwe û çekdarê ku bi xwe re anîbû re berda. Belkî di temamê emrê Circîs de wek vê carê ku jê re ewqasî baş li hev hatibû, tu carî jê re wilo baş li hev ne hatibû. Çar-pênc çekdar bi reşaya sibehê re ji mala wî derketibûn û Atîlla jî bi ronahiya sibehê re girtibû ser gund.
Him jî bi sîlehên giran. Ji bilî çar cemseyên tije esker, bi du cemseyên tije tîm û komando, du panzeran û helîkoptereke skoskî hatibû.
Çekdarê ku mala Circîs qul bi qul nas dikir, esker birin ser du xeşîmeyan. Çar bûn. Wî bi herduyên din nizanîbû.
Eskeran jî piştî ku di xeşîmeyan de çewalek kovar û roj-
56
nameyên partiyê, tibabek kitêbên Reyis û ewqas jî sûretên wî dîtin, «komutanê min me zeft kirin, me zeft kirin!..» gotin û bi bazdan anîn li wê navê kirin kêşî.
Atîlla jî bi vê yeka ha bêhtir hêrs bû, rîha Circîs berda û vê carê jî rahişt zixurekî mezin û guhê wî ê çepê bi zixur firkand û hey firkand. Dû re jî serê xwe bi ser ê wî de tewand û hêdî bi hêdî got:
«Lawê dêlikê, ka qaşo têkiliya te bi wan re tune bû!
Îcar tu ê çi gûyî bixwî, qewad?»
Circîsê xwedî tecrûbe, xelasiya xwe di mandelê de dît û xwe li mandelê şidand:
«Na qumandar beg, na, ev ne karê me ye. Hay û bayê kesî ji me ji van kaxetk maxetkan tuneye. Him ji xwe ji me re ne lazim in. Ji mala min kesekî ku bi tirkî bizanibe bixwîne tuneye. Dîsa hin xêrnexwazan xwestine ku ocaxa min bitefînin. Wan ev kaxetk di qulik milikên dîwarê min

de veşartine. Her tim wilo li min dikin...»
Atîlla ji ser xwe çû! Mîna ku mirov rahije zarokekî û wî pirî zozanan bike, wilo rahiştê, bilind kir û çend hilman ew di nav lepên xwe de gijgijand. Pişt re jî heta ku jê hat bi hewa de bilind kir û xwe ji ber da alî. Circîs mîna pisîkê ket û di cihê xwe de bêdeng sekinî. Lê wî bela xwe jê venekir. Destê xwe avêt ser qevda qezetoreya bi xwe ve daliqyayî û xwest ku ji kêlên bikişîne. Dev jê berda. Bi demaçeya xwe a simîtweso lîst û hema pê re jî ji qubûrê kişand. Siwar kirîbû. Wî bi destê ku demaçe girtibû ji eminyetê kir û li bêndera kovar û kitêban girêda. Gundor vala kir. Kela wî hênik ne bû. Mîna cencerê di ser wan re gêr bû; dan ber şeg û pegan, bi erdê ve heciqandin û tifî wan kir.
57
«Min di der qu...nîho, yaho ev zir loda ha, çawa diçe qulik milikên dîwarên te! Pîqabekê tije dikin, pîqaaab!» got û vê carê jî mîna şivanan bi kitêbên ku her yek ji wan li derdora çar sed rûpelî dihat, veteqilî:
«Yek, dudu, sisê, çar, pênc, şeş, heft, heşt...»
Circîs jî li himberî derbên wî bêyî ku destên xwe ji xwe re bikirana star, li ser pêyan sekinîbû û di cihê xwe de mîna risês ne diqeliqî. Li gora wî ew yeka han jî rengekê libexwedanê bû. Atîlla heta bi sîh û pêncan hejmart.
«Bide pêşiya min da em herin ser xeşîmeyan û li wan binerin bê ka kîjan xêrnexwazî îcar ew kolane, kûçik!» got, bi zendê wî girt û berê xwe da hewşê.
Lê çawa çû wilo jî vegeriya ba kitêban û ji eskeran re

got:
«Van kitêban yek bi yek bihejmêrin!»
Sê eskeran piştî ku kitêb hemû hejmartin û gotin
«komutanê min, sed û pêncî û şeş kitêb in», Atîlla keniya
û keniya û ji xwe re got:
«Hema bi van kitêban tenê jî mabe, xuyaye ku ev zilam
mirovekî çiqasî beredayî ye! Mirovê ku ne beredayî be
nikare ewqas kitêb binivîsîne. Di tarîxa dinyayê de ne fîlozof
û ne jî romannivîsên herî mezin bi vê ecêbê kitêb ne
nivîsandine, haho!»
Pişt re jî ruyê xwe tirş kir. Circîs da ber dahfan û xwe
li hewşê girt.
Lê çar pênc gavekî ne çû dîsa sekinî û di ber xwe de
got:
«Ez wî bibim ser xeşîmeyan wê bibe çi yanî? Ma qey
fêde dike. Wê tiştekî wilo bibêje ku ez rêya ber lingên xwe
nebînim! Bilahî wê bibêje ku xeşîme, ji bav û kalan wek
58
diyariyekê ji me re mane, qomandar beg!»
Qêriya:
«Eskerino, herin Quranê ji min re bînin!»
Eskeran bi yek bêhnê re Qurana Circîsê ku ji salê carekê
devê wê vedikir û di cih de jî digirt, anîn û dan dest.
«Cidhan, zû were vir!»
Cidhan ji nav komê pengizî û wek bê hat:
«Kerem bike qomandarê min!»
«Destê xwe deyne ser û min çi got tu jî wê bibêje.»
«Ez bê destlimêj im. Guneh e, ez nikarim destê xwe

bidêmê; wê bi min vede.»
Atîlla ew baş nas kiribû û bi ser serfa wî vebûbû. Bi xweşî domand:
«Lê bêyî ku mirov destê xwe bidêyê, mirov dikare pê sûnd bixwe, ne wilo?»
«Erê mirov dikare, lê mekrûh e.»
«De ka bêje, bi vê Quranê, hayê bavê min ji çekdarên Reyis, xeşîmeyê û van kitêban tuneye!»
Cidhan piştî ku ziq li bavê xwe nerî, serê xwe berda ber xwe û dîsa rakir û lê nerî, bi bavê xwe re peyivî:
«Yabo, ez te fêhm nakim bê tu çima ewqasî xwe dide erdê. Sûcê me li meydanê ye, qebûl bike...»
Atîlla gotina wî birî:
«Sûnd bixwe!»
Sûnd xwar û him jî bi wahc got:
«Bi vê Quranê hayê bavê min ji her tiştî heye!»
«Û ji çekdaran?»
«Ji çekdaran jî. Bi destê sibehê re wî bi xwe mast bire ji wan re. Mastê xwe xwarin û çûn...»
Di vê bêhnikê de tirsa Circîs a herî mezin ji xeşîmeya
59
sîlehan bû. Cidhên bi xeşîmeya tije sîleh dizanîbû û xeşîme jî keşif ne bûbû. Li qirdê wî ku hayê Atîlla jî bi tiştekî wilo ne ketibû.
Circîs xwe zewirand:
«Begê min, nabe ku mirov bi dewla dînan here avê. Temamê vê birekê dizane ku ev mêrik dîn e. Jina xwe fetisand. Bi zarokan re dilîze. Bi pîrekan re diçe bêriyê û pez

didoşe. Rêxê tîne ber destê wan û bi wan re kozîdanan
lêdike. Sergînan dide hev. Axuran rêş dike. Hevîr dike.
Xwarinê çêdike. Bin zarokan paqij dike...»
Atîlla jî ecêbmayî lê guhdarî dikir. Di dawiyê de li
pêpîka xwe xist. Esker hemû li hev civiyan.
«Ji bilî wê pîra vezilyayî», Perîxanê bû, «her kesî têxin
cemseyan, em diçin tûgayê», got û berî her kesî ew li cîba
xwe siwar hat.
4
Ji tûgaya Mêrdînê pîrek û zarok, piştî hefteyekê û
zilam jî piştî du mehan hatin berdan. Lê Circîs ew zûberdan
elameta nexêrê dît. Pê re şika ku Atîlla wê beleyekê
mezin bîne serê wan, çêbû. Û wilo jî derket.
Eskeran piştî ku sê neviyên wî li qelêç li ber pez û
dewaran kuştin û navê terorîstiyê bi wan vekirin, qelaç bi
carekê ve li gundiyan qedexe kirin. Dû re jî lemên bîstanan
rakirin û gelek mêwên rezê Circîs birîn.
Mirov bi xwe û yan jî zarok, dibînin û hîn dibin. Û zû
bi zû ji bîr jî nakin. Ev aliyekî insên e. Lê carina mirov
digot qey Circîs, bi tena serê xwe mezin bûye û aqilê wî
di çimekî mejiyê wî de gihaye hev. Ne ku her tim tişt ne
60
didîtin; tiştên ku girêdayê wan tiştan bû carina ne didît.
Xwe ji bîr dikir û ketûber dida nav. Digel ku serê dewletê
başçawîşê Stilîlê, lingên wê yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê,
destên wê tûgaya Mêrdînê û gewdê wê jî kolordiya Diyarbekirê
didît, temamê hişê xwe berda ser gilî. Dewlet ji
esker û polîsan cihê kir û ber bi meqamê dewleta ku wî di

serê xwe de çêkiribû beziya. Ji dewleta xwe bi tenê dixwest ku bi qeweta heq û hiqûq û edaletê bikaribiya li gundê xwe bima û di nava azadiyê de jiyaba. Lê mixabin sîleh jî alavekî ku heq û hiqûq nas ne dikir. Û dora wî jî bi sîlehên herî giran hatibûn rapêçan. Li cihê ku esker heba qîmetê azadiyê tune bû. Û herêma wî jî tije esker bûbûn. Qewetê edalet avis dikir û edaletê jî qewet diparast. Û tu qeweta wî jî tune bû. Ev hemû li aliyekî tew bi ser de jî her roj karwanên koçê jî di ser rêya ber gundê wî re bi nav Tirkiyê de diçûn. Qemyon diqulipîn û insan diperçiqîn.
Terektor û erebe bi rêyan de diman û eskeran jî ew didan ber devê xweşkêş û çapiliyan. Carina jî koçmal hemû dişewitandin û bûyer diavêtin stuyê çekdaran. Di rêyan de mayin datanîn; mayinan bi terempêlan re insan perçe dikirin. Bi kemînên xwe ên di best û newalan de tenterûs sax bernedidan. Di her kemîna wan de tu carî insanek sax ne difilitî. Dikuştin, serê wan jê dikirin, asaq di laşê wan de dikirin û dû re jî bi şîn û girî piştî ku ew pêş masmedyayê dikirin, vedişartin. Circîs ew hemû didîtin. Circîs bi wan hemiyan dizanîbû. Koça herî mezin her tim di zivistanê de dibû. Bi destpêka zivistanê re dema ku hewrên giran serî radikirin, ew ji paca qesra xwe dernediket. Bi dûrbînê li ser rêya Îpekê li insanên ku mîna zerzûl û xazikan di qemyon, terektor û erebeyên dewaran de xuyanî dikirin,
61
temaşe dikir û li kabên xwe dixist:
«Dewlet dixwaze miletê me ji kokê de biqelîne. Esker welatê me vala dikin. Ev qirkirin e. Ax ji destê van zarokên

me ên ku li çol û çiyan, me bi xwe re dikujin û li tiştekî jî hayî nabin!...»
Circîs xwe li giliyê eskeran şidand û dîlekçeyek da qeymeqamê Nisêbînê. Wilo jî yek da waliyê Mêrdînê û mehkemeya wê. Qeymeqêm serî li Atîlla, walî û hêkim jî serî li generalê tûgaya Mêrdînê dan. Atîlla pir hêrs bû. Lê a wî dîsa jî ne bi qasî a başçawîşê Stilîlê û generalê tûgayê bû. Başçêwîş bi xwe pir zor anî ku dîlekçe çima pêşî ne çûbû ber destê wî. Gilî ji ba wî derbasî Nisêbînê û ji wir jî derbasî Mêrdînê dibû. Qanûnên wan wilo bûn û Circîs jî bê qanûnî kiribû. Di eynî rojê de bi mifrezek eskerên xwe ve girt ser Zorava. Gundî bi carekê ve derxistin ser bênderan û ketûber dan ber hev. Bi rîha Circîs girtin û bi dû xwe de kişkişandin. Circîs jî, «deveden buyuk fîl vardir gidiklî qomandar! Ji devê mezintir fîl heye!» got û liberxwedana xwe dom kir. Çawîş bi gotinên wî tam ji ser xwe çû û bê ser û ber lê xist. Zendê wî ê çepê şikenand. Çermê serê wî bi serpozkên potîna xwe bi du-sê cihan çirand. Lê dîsa jî kela dilê wî hênik ne bû. Bin terektoreke wî tije pûş kir, ew bi kursiyê terektorê ve girêda û agir berda pûş. Bi agirê wî re Circîs jî bû barûd û xwê û pê de teqiya û teqiya: «Qeprax qomandar, namûsiz ewladî esker, qeprax dewlet, qeprax general, hikûmet, walî, qeymeqam, hakim!...» got û kesek qûnziwa berneda.
Di dawiyê de çêwîş di ber xwe re berda û ew ji nav êgir derxist. Lê terektora wî a fergîson tibabekî şewitî.
Ev başçawîşê Stilîlê bi rastî jî tam kurkureyekî zilaman

bû. Gava xwe sivîl girêdida û xwe berdida nava sûka Nisêbînê, mirov digot qey qeymeqamê Qubînê daye sûke. Dengê zîqe zîqa qundera wî ji vê dikanê derbasî dikana din dibû. Mêş di ser porê wî ê birqoyî re dixijiqîn, qerewat li ser navikê disekinî, dimilmilî, qiyamet pê dixist û diçû. Û li Zorava jî wilo li serê Circîs û gundiyên wî dikir.
Piştî başçawîşê Stilîlê, di a din î rojê de vê carê jî Atîlla bi pênc-şeş cemse eskerên xwe ve hat gund û bi haweyê ku dewlet ew bi xwe ye, di dîwarên qesra Circîs de cercûrê G3a xwe vala kir. Dû re emir da eskerên xwe ku ew jî wek wî bikin. Wilo kirin. Circîs jî serê xwe di paca qesrê re derxistibû, bi herdu destan li sênga xwe dixist û digot: «Ez im ew berazê herî mezin, berdin min beraz î! Ê ne ez ê wek we nekim!...»
Atîllayê ku li gundekî Omeriya neh gundî bi hev girêdabûn û bi saxî şewitandibûn jî, mîna pîsîka ku mişk zeft kiribû û ji xwe re pê dilîst, li wê navê diçû û dihat û pê dikeniya. Di eslê xwe de, weke mirov firek av vexwariba, dikarîbû tenterûs ji wan sax berneda. Li Torê mirovekî di tayê Circîs de li bînbaşiyekî komandoyan zirt kiribû û ew zirta wî bûbû sebebê ku bînbaşî zilaman bi carekê ve bide ber guleyan. Atîlla jî ji dêvla ku wilo kiriba, îcar bêyî ku tiştekî ji kesî re bibêje, agir bi bênderên nîskan danî û çû. Li gora hesabê Circîs, eskeran li dora du sed olçek nîskên ku hatibûn çandin bi carekê ve şewitandibûn.
Circîsê ku di serhildana xwe de neheqî ne didît û tu qisûr ne dixist aliyê xwe, Atîlla wek kêrekê di ser dilê xwe de didît û li himberî wî bûbû agirê semewatan. Lê Atîlla û

eskerên xwe jî bûbûn agirê dojehê û li Circîs dilîstin.
Circîs piştî vê bûyerê dîsa çû gilî. Û bi ser de jî giliyê
63
xwe bi nozdeh dîlekçeyan bir heta bi Enqerê ber destê
serokwezîrê hikûmetê. Wek bizina ku nanê şivên dixwar
lê hatibû. Neditebitî. Hakimê mehkemeya Mêrdînê filehekî
midyadî bû û dilê wî jî her tim jê re xwestibû. Hêkim li
Mêrdînê ew xewle kir:
«Dev ji vî girê xwe ê pîs berde û bi a dewletê bike.
'Dewlet ji bo milet heye', gotine, lê derew kirine. Insan
dewlet û dewlet jî insan e. Dewlet ji bo insên û insan jî ji
bo dewletê hene. Em hemû bi dewletê hene, Circîs axa. Li
Ewrupayê jî wilo ye. Ferqa dewletên herêma me û ên
ewrupiyan bi tenê ew e ku em dikujin û dimijin û ew jî
nakujin û dimijin. Edaleta ên me berrî, a wan kedî ye. Ew
li mirov guhdarî dikin û wek xwe û ên me jî bêyî ku li
mirov guhdarî bikin wek xwe dikin. Em bi êşkenceyê
gotinan ji devê mehkûman û ew jî bi dermên, tirsfirandinê,
heremolî û binpêkirinê digirin. Dijminahiya bi dewletê
re li tu derê dinyayê qebûl ne bûye ku heta li vir qebûl
bibe, ezbenî. Tu dilê dewletê ji xwe dihêlî. Li cihê xwe
rûne û hew!»
Lê Circîs hew ne kir:
«Hakim beg, wilehî ne em bi dewletê, dewlet bi me
daketiye, wey.»
Hêkim xwe jê aciztir kir:
«Herin bi a eskeran bikin, xwe di gû û rêxê bidin da
hûn di gundê xwe de bimînin. Binere li nav tirkan wê heta

bi jinên we jî dev ji we berdin û bi dû xelkê kevin.»
«Lo hakim beg, lo! Bi telaq wê tu kes jinên me ji xwe re neyinin. Me li ser her yekê ji wan sed ton gubre derxistiye; wê kî mala xwe xerab bike wan ji xwe re bîne û wî zir deynî têxe stuyê xwe!»
64
«Li min guhdarî bike bê ez çi dibêjim! Hûn kurd miletek in û milet jî bi ax û zimanê xwe heye. Îro hûn qels in, bi ser we de şapek hatiye û wê ev şap derbas bibe. Dibe ku di demeke kurt de hûn ji tirkan jî xurtir bibin. Gotineke pêşiyên we kurdan heye dibêjin, 'Çerxa felekê geh li jêr e geh li jor.' Îro hûn li jêr in. Lê gava we axa xwe berda, hûn ê tu carî dernekevin jor. Bi axê re wê zimanê we jî têk here Circîs axa, axa! Hûn bi zimanê xwe hene. Milet cesed e, ziman ruh e. Ji bo selameta ruhê milet, pîsitiya herî mezin jî şeref e. De biçe û tu ji xwe re çawa dikî beke!»
Ya çûnê çû, lê dîsa wek xwe kir. Dev ji giliyê xwe berneda. Di dawiyê de çekdaran zarokên wî jî dan dû xwe û hemiyan bi hev re doza barkirinê lê kirin. Hîletê wî ji vê gotinê diçû. Bi dijwarî li ber xwe da. Lêbelê dinya lê teng bûbû û ew jî di nîvê dinyayê de bû. Li gora zarokan, ya divabû bar bikirana û yan jî divabû bûbana pîber û şer bi çekdaran re bikirana. Di rewşeke pir xerab de heyirî mabûn. Lê serê bavê wan jî dewixîbû. Rê ne dibir ser tiştekî. Bima jî felaket û biçûya jî felaket bû. Lê divabû biryara xwe bida; gihabû dawiya xwe. Li gotinên Yastar Elo difikirî û gotin diwezinandin:
«Apo, liberxwedana te nema fêde dike. Ji serî de te her

tişt ji dest xwe berda; ji serî de mîna ku tu di binê erdê de bû, te tiştek ne dît û te da dû Reyis. Te di siyaseta felekî de hikmê şerîetê derxist pêş û di şerê şeytanan de tu bû melekê rehmê. Li himberî konebaz û pîçên zemên te wek Serdarê neviyê xwe kir, te bi qûna exlaqê kurdan girt û tu meşiya. Bavê min digot ku siyaset mîna nehberkê ye, lawê min. Di nehberkê de xeta herî piçûk dibe sebebê siwarbûnê. Îcar gava ku li mirov siwar hatin, bi fikkirina çend

65

zixuran re çeq û berê li mirov çêdikin û mirov bi carekê ve têk diçe...»

Wilo bi rehetî wê nikarîba xwe jê xelas bikira. Mîna derwêşan diponijî. Bi qasî ku diponijî ewqasî jî xulqteng dibû. Feqîrên herêmê her tim xulqteng bûn. Heger Circîs jî ji wê tebeqeyê hatibûya, li himberî vê xezeba ku bi serî de hatibû wê xwe negirta û ji sedîsed dîn bûbûya. Him jî dînekî ku kirasê xwe diçirand û şilfîtazî digeriya. Lê dîsa jî ne ku ber bi dînbûnê de ne diçû.

Piştî ku kufletê wî a xwe lê kir yek, xwe demekê ji civatê jî dûr xist. Her roj bi sariya sibehê re wê xwe berda nav erdan, kevir û zixur bidana hev û bi reşaya êvarê re bihata malê. Li gora wî, erd ji keviran safî dikir. Lê erdê wî jî mîna kefa destê mirov bû. Ji hemû aliyan ve rewşa xwe diteqiland, mîna mêzênê tişt diwezinandin û dîsa jî tu rêya xelasiyê ji xwe re ne didît.

Gundê min ji destê min diçe. Kufletê min li Tirkiyê eware dibe. Keçên min dikevin rêyên xerab. Lawên min dibin pêxwas. Û a herî zor jî gava ez bimirim wê min di

nav tirkoyan de veşêrin! Di vê barkirinê de tiştekî ku ez ê qezenc bikim tuneye. Ez ê çawa têxim serê van zarokên xwe? Emirqesifiyan nema li min guhdarî dikin. Ew jî xerabe derketin. Na, zarokên min baş in. Bi guherandina neqebên welêt û dinyayê re, helbet wê gelek tiştên wan jî bên guhertin. Belkî jî wek wan e. Rastiya her tiştî bi dawiyê ve girêdayîye, Circîso. Gava dawiya tiştan hat, rastiya tiştan jî derdikeve meydanê. Zarok vê rastiyê dibînin, ez nabînim. Lê dîsa jî tiştek ji eva ku wê mirov li ser axa xwe, bi destê van zalimên eskeran bê kuştin, bi şereftir nîne! Oooh, hema min jî bi qûna vê şerefê girtiye û girti-
66
ye! Welatê ku wê bi kuştina kes û kûsê min hebe, hema bila tune be. Kenêr rast digot: Gava em hebin her tişt heye û gava em tune bin jî tiştek tuneye. Û ax, mal û milk û welat jî em in. Kenêr alimekî mezin bû. Me çi ji welêt e. Em divê pêşî hebin. Lê ma ne em jî girêdayê axê ne û em bi axê hene. Bê kê bîra ku ev kurmancên me navê axê, li welêt bikin dibir, kuro! Yabo mêrikan hingî ku bi serê wan de hatiye...

Piştî fêhm kir ku gula herêmê Omeriya ye û bi Omeriya herêm li ser lingan dimîne, xwe avêt axayê omeriyan.

Li çiyê bi darî wî ket û xwe jê re kir erd. Lê axayê ku çekdaran ew xayin ilan kiribûn û axa jî li ser kurdayetiyê çarpênc salan di girtîgeha Diyarbekirê de mabû û bi ser de jî eskeran zendekî lawê wî jê kiribûn, pîbarê wî ranebû û kelûgirî got:

«Heger eskerên tirko temamê zarokên min ser jê kiribana

jî min ê ji cihê bav û kalên xwe bar ne kiriba. Lê ez xulam, gava ku ez bi karê pîberayetiyê rabim, wê xelk jî wî çaxî ji min re bibêjin ku axayê omeriyan zarokên kurdan dikuje. Ev yeka han bi min nakeve, dosto...»

Bi dû vê hevdîtinê ne bi gelekî, axayê ku pîberayetî wek dijminayetiya herî mezin bi miletê kurd re didît, berî eşîra xwe bi nav tirkan de bar kir. Bi barkirina wî re Circîs ji mana li gund tirsiya û li çûnê fikirî. Lê piştî bihîst ku axa li nav tirkan bi tena serê xwe maye û bûye parsek, dîsa lingên xwe dan erdê û bi ser zarokên xwe de hilbû:

«Lawo hûn dizanin bê em ê bi ku de herin, lê hûn nizanin bê wê çi bi serê me bê. We aqilê xwe xwariye, avareş bi çavên we de hatiye. Li derdora xwe binerin û ji xwe re fêhm bikin bê çi bi serê lawên camêran de hatiye. Rewşa

67

axayê omeriyan rewşa ku em ê sibehê têkevênê ji me re şerh dike, ehmeqino. Em ne diçûn devê hespê Rizoyê xerzî. Ma we bihîstiye bê li nav tirkan çi bi serê wî hatiye? Ji destê feqîriyê piştî ku kufletkê wî ji hev belav dibe û saloxa keçeke xwe li kerxaneyê hiltîne, sewsî dibe û xwe di behrê werdike. Wax, wax!...»

«Yabo dev ji vî aqilê xwe berde û bes bi çavên pîrekan li me binere. Te wilo xistiye serê xwe ku ne bi vê Zoravakê be, em ê tu carî nikaribin xwe bidebirînin. Ma em bibin cahş baştir e qey? Tu ji aliyekî ve seraqet behsa namûs û şerefê dikî û ji aliyekî ve jî tu dixwazî me bikî bênamûs û bêşerefên herî mezin. Ma wilo dibe, hi? Na, nabe. Em qebûl nakin. Pazdeh-bîst xortên me ên hêja di ber kurdan

de hatine kuştin. Hema ji bo wan jî mabe, mirov nabe pîber û navê cahşitiyê bi dû xwe naxîne. Ev niha em ê çima li nav tirkan birçî û tazî bibin. Ji bilî naşîkên me, em sê-çar zilamên ku karin kar bikin di malê de hene...»
«Lawo bi a min bikin, binere hûn ê dû re li xwe xînin!...»
Vî mirovê ku ji xwediyê gund bêhtir xwe wek koleyê gund didît, nema dizanîbû bê wê xweliya kîjan welatî bi ser xwe dakira. Di kar û barê nav erdan de çermê destên wî bi qasî çekurekê hişk bûbû. Ruyê wî mîna çermê serê wî qalind bûbû. Li Zorava çêbûbû û mezin bûbû. Kalik kalikên wî di halekî ne xweş de li herêmê bi cih bûbûn. Gund ava kiribûn. Erd ji lat û tahtan feteh kiribûn. Çiya û newal, çol û beyar, sirt û qelaç, şewl û pahnav, rê û duryan, şikeft û berqef, çal û bîr û gelek tiştên din bi navê wan bi nav bûbûn. Kuştibûn û hatibûn kuştin. Talan kiribûn û talan bûbûn. Xwîna wan li ser vê axê rijiyabû û di bin vê
68
axê de hatibûn veşartin. Û ev hemû li aliyekî bi ser de jî tew eskeran li ser tiştên pûç û vala goristana Pîr Kemêl dabûn ber devê xweşkêş û tematêkan. Gora Heso û Sarê û çend kesên din vekiribûn û li «terorîstan» geriyabûn. Kula heyfa goristanan mîna çiyayekî xwe berdabû ser dilê wî.
«Min di hikmê van pazdeh-bîst salên derbasbûyî de ji xwe re bi tenê ev fêhm kir: Tiştek bi qasî şer ku dikare insên zalim, cahil, kerr û kwîr bike tuneye! Îcar lawo, hema hûn ji bavê xwe re çi bibêjin heqê we ye û hew. Ez ji serî de neheq im...»

Him xwe neheq didît û him jî destê xwe ji kar û barê malê ne dikişand. Çavên wî ji zarokan ne dibirî. Bibiriya jî vê carê dilê wî bi a wî ne dikir ku her tişt bi destê wan ve berda û xwe ji her tiştî bêrî bikira. Dema ku xwe berdida nav erdan, heta ku ro diket zerikê, ha ha xwe bi xwe dipeyivî; rê dida ber her kesî û şîret li her kesî dikirin. Pîrek hevalê wî bûn. Ne dixwestin ji gund bar bikin. Ji zilaman bêhtir ew bi vê yeka han diêşiyan. Lê ma li ber çi bûn? Yek ji wan jî ne li ber tiştekî bû.

«Li jina xwe guhdarî bike, lê wek xwe bike», pêşiyan gotibûn û Circîs û civata xwe jî bi wan re her tim wilo meşiyabûn.

«Hespa esîl hindikî dixwe û di bin siwarê xwe de kemlan diçe û bergîl jî pir dixwe û di bin siwêr de tiran dike û lotikan diavêje», Heso ev xistibû serê jinan.

Circîsê ku ji aliyekî ve zarokên wî, ji aliyekî ve eskeran û ji li aliyekî ve jî çekdaran a xwe lê kiribûn yek, di dawiyê de teslîm bû. Bi du sed hezar markê ku Reyis wek alîkariyê xwestibû bidêyê û ji gundê xwe bar bike, qanih bû. Qanih bû lê vê carê jî Rayis li ser a xwe nema û xwe

69

da ber pêncî hezar mark î. Bi dû çendeyekî dijwar de, Circîs ew pere jî qebûl kirin. Lê Reyis ew jî nedanê û Circîs mîna hêka qitikê bi tena serê xwe li wê navê ma. Qeranê berberiyê û pevçûnê bû, lê nikarîbû tiştek bikira. Destekî bi tenê bû û ji destê bi tenê jî deng ne dihat.

70

BEŞÊ DUDUYAN

1

Seydoyê birayê Reşoyê Sarê, Sînanê lawê Erol Efendî
û Restemê lawê Kenêr, li Swêdê dev ji doza ku pê hatibûn
berdan û ketin tolaqa jinan. Jin di çavên xwe de ji meseleya
xwe a netewî jî mezintir kirin! Li gora wan li Swêdê
pevçûna bi jinê re, ji pevçûna bi eskerên tirkan re hîn dijwartir
bû! Û heta belkî ji şerê bi Emerîkayê re jî!
Di eslê xwe de Seydoyê ku baş dizanîbû bê dawiya
zewaca wî jî li Swêdê wê çawa bihata, ne dizewicî. Lê apê
wî Luqman pê ve bûbû dirdirk; ketibû bin û ji Nisêbînê û
Mêrdînê ha ha jê re telefon dikir:
«Ma tu nemêrî ku tu nazewicî, te em hetikandin!»
digot û hey digot.
Seydo jî li ber xwe ket û li ser daxwaziya wî bi yeke ji
herêma xwe re zewicî. Jin û mêritiya wan heta pênc salekî
jî baş çû. Car carê wê got, wî bi a wê kir; wî got wê bi
a wî kir. Gotinên çort nedan ruyê hev. Zarokên wan çêbûn
û herduyan jî li zarokan nerîn. Lê piştî ku jina wî jî dest bi
xwendina zimên kir, ji nişkê ve nav wan xerab bû û li binguhê
hev ketin. Pevçûn û qirik li hev qelaştin. Di dawiyê
de Seydo jî mîna gelek mêrên biyanî, ji mala xwe reviya.
Digel ku bi vê revê barê jiyanê li ser xwe girantir kir, dîsa
jî ji dûr ve destek da jina xwe û zarok bi xwedî kirin. Rez
xerab bû û bi ser de jî teyrokê lê xistibû. Derdê jina wî û
herçar zarokên wî ne bes bû, îcar jina Serdêr û zarokên wî
jî lê bûbûn bele. Li wan jî dinerî.
Seydo bi terikandina malê re ling ne xistin bin xwe. Ji

vî karî bazda karê din; ji xwarin û vexwarina xwe qut kir
û da jina xwe û a Serdêr. Bi kufletê xwe re bi vî haweyî
demekê bir. Lê piştî ku jina Sînên, a wî û birek jinên din
dan dû xwe, di kongreyê de girtin ser wan û kongre ji hev
belav kirin, Seydo bi a dawî rabû. Him erza jina xwe şikenand
û him jî bi hevberdanê zirt lê kirin. Lê bi vê tenê jî
nema. Berê xwe bi Sînên vekir û got:
«Ji vê eybtir tiştek nîne ku em hîn nikarin mezinahiyê
li jinên xwe bikin, em xwe li mezinahiya kurdan girêdidin
û di bin sereketiya te de bi şazdeh kesan em kongreyeke
kurdistanî li dar dixînin. Ev yek. A din, doza kurdan bi
tenê ne a mêr e, a jinê ye jî. Kurdistan a me hemiyan e.
Bêvila jinê divê bi wî agirê ku li ser Kurdistanê dibare,
bişewite. Sisê, li Swêdê jiyana bi jina ku ji kultura kurdî
dûr ketiye, bênamûsî ye. Ya hûn ê bênamûs bijîn û yan jî
hûn ê xwe ji wan berdin...»
Piştî bûyera kongreyê bi çend rojekî, ji rêya a xwe derket,
bû Circîs û keysa xwe bi berberiya bi jinan re xweş
kir. Li vir û wir hofk gerand û got:
«Jinan em kirine ne tiştek. Zilamtî bi me ve ne hiştine.
Hayê me ji me tuneye ku em şibiyane jinên herêma xwe û
ew jî şibiyane mêrên herêma me. Xwe li malê vezilandine
û karê hindur jî bi carekê ve qulipandine ser stuyê me. A
me ji mêritiyê bêhtir bûye jîgologî. Em bin zarokan paqij
dikin. Em li vir û wir wan digerînin. Em memikê dixin
devê wan û bi berger û lavlavkê wan haş dikin. Em wan di
nav livînan de diteptipînin, çîrokên dapîran ji wan re
dibêjin û wan dikin xew. Erzaniyek li ku çêdibe, jin me bi

wir de dişînin. Em hevîr dikin, cil û firaxan dişon. Em xwarinê çêdikin. Em mîna hudhudk ling naxin bin xwe; li
72
ber destên wan bi vir de û wir de gêrdibin û xanim hîn jî qîma xwe bi me nayinin! Tew hin ji wan şekalan jî di mêrê xwe de werdikin. Êdî divê em ji xwe fedî bikin, jinan piçekî ji ser bêndera xwe dûr bixin. Û hema hinekî jî bi qasî zilamên swêdiyan tevbigerin. Jinên swêdiyan ne gotinên çort bi mêrê xwe re dikin û ne jî şiqam, kulmisk û pehînan di wan werdikin.
Em pir nizm bûne. Me di pratîkê de dev ji kurdayetiya xwe berdaye. Me ji bîr kiriye ku insan qabilê her tiştî ye. Mirovê dema ku bixwaze dikare gelek tiştên hêja bike. Bi insanan jiyan geş û xweş û ne xweş dibe. Helbet bê bedêl tiştek ava ne bûye. Her tişt bêdêleke xwe heye. Lê dîsa ew insan e ku bedêlê li ser xwe giran û sivik dike. Me li ser xwe giran kiriye, hevalino. Me ji bîr kiriye ku insan şertan diafirînin. Zeman bi insên him tarî û him ronî dibe. Me gelek tiştên ku di wextê xwe de divabû bihatana kirin, ne kir. Lê dîsa jî em hîn hene û bi miletî em li ser lingan e. Em xwe nadin ber bêr û em gilî û gazinan dikin. Ma dibe? Gundî bi ronakbîran dibin bajarî û dû re jî milet. Milet bi ronakbîran hene. Em ev ên li Swêdê dikarin mezinahiyê li temamê Kurdistanê bikin. Lê me daye dû jinê, selameta zarokan û demokrasiyeke pîrekî. Pîza, korv, gûdîs, pûtatîs! De çêke, de bikerife, de bifroşe, de bikire, waweylê ev çi kûçkanî ye! Û di dawiya mehê de jî qurûşek bê çî ye di destê me de namîne. Em li vî welatî bi nan û zikê dijîn.

Îcar ka ew manewiyeta me? Li ku ma ew şexsiyeta me? Wey li halê me be! Em ewqasî bi van zarokan daketine û di dawiyê de jî yek ji wan nabe malê me û kurdekî. Em zarokan ji ewrupiyan re mezin dikin. Zarok dihilin. Heta ku em kurd jî mîna tirkan nebin xwedî dewlet, êm ê li
73
Ewrupayê nikaribin pêşî li ber hilandina xwe bigirin. Bi vî haweyî çawa ku me jin bi der da, zarok jî wê av û av herin. Em xwe dixapînin. Sîno ling bide ber xwe. Di heyamekê de te mezinahî li deh hezaran dikir. Tu agir bû, agir! Komikek gava bigihê hev û ji dil û can xwe bidê, dikare çimekî dinyayê xerab bike. Lê li vê Swêdê çirûsk bê çî ye nema ji me diçe!»
Sînên xwe aciz dikir:
«Me heta vir anî. Em ne bavê milet in, milet bavê me ye. Bila ji xwe re hin din peyde bike. Temam em xerab e! Ma insan xerab dernakeve!...»
«Me heta vir anî rast e, lê me çênekir û anî. Me, tiştê ku hebû jî bi carekê ve xerab kir. Milet bavê me ye ew jî rast e. Lêbelê ew milet heta ku lawin din çêke û wan li ser serê xwe bike mîr û amîr, wê tirk kerrê wî li guhên wî bisekinînin, bavkê mino.»
Aydin jî digot:
«Howeh ev kurd çiqasî bêaqil in(!) Ji doza kurdan him rehettir û him jî zortir tiştek nîne. Dema bibin yek wê bikaribin temamê Kurdistanê azat bikin. Problema wan ji yekitiyê pê ve tiştek tuneye. Serekên wan ne tebût in. Ewrupiyan bi yekitiya xwe li ser behran pir ava kirin û di

bin û ser re trên û terempêl ajotin. Ka ew aqil!»
Ji şûrkêşên şoreşgerên bûblaniyên wextekî, rewşa lawê
Kenêr Restem heta ku ji kar ne hat avêtin jî baş bû. Lê
piştî ku bê kar ma, wî û jina xwe rahiştin hev û di sefê
Seydo de cih girt, jiyana wî jî serûbinî hev bû.
Restem rehet ne sekinî. Xwest ku jina xwe bikuje.
Lêbelê Seydo li dij derket û jê re got:
«Jinikê nekuje, yeke din bîne...»
74
Mafir bi a wî kir û ji welêt yeke din anî. Lê piştî ku nav
wî û wê jî xerab bû, vê carê jî li anîna yeke din geriya.
Seydo bi xwe ne xweş anî:
«Ji welêt jinan neyne. Tu keça Qudûr Beg jî bînî vir,
piştî ku hînî zimên bû û sîstem nas kir, wê wek te neke.»
Restem bi a xwe kir û ji Yastar Elo qewet xwest. Elo jî
texsîr ne kir. Bi metodên xwe jinek jê re şand. Lê piştî ku
a duduyan jî şand û Restem bi wê re jî derneket serî, Elo
dev jê berda. Restem hinekî serçelq bû û li pêş çavên
Seydo rahişt kêrê ku kîrê xwe jêke. Seydo hêrs bû:
«Dev ji namûsa kurdî berde! Ma namûs hema hemû
ketiye qulika mîzê, hi? Ez dibêjim na. Min her tim gotina
Circîs di bîra te de anî û got, gava mirov xwe bi nav destê
jina ne esîl de berda, şexsiyeta mirov jî têk diçe. Lê te xwe
bi destê wan ve berda. Li cihê xwe rûne û ne ê xwe û ne jî
ê bi wan ve jêke. Xwe bi wan re nehetikîne. Berde û têkiliya
xwe bi carekê ve ji hemiyan qut bike; li gora kultura
swêdiyan tevbigere û bi swêdiyan re wek jin û mêr bijî.
Ma tu ji arîstokratên swêdiyan mezintir î? Ew jî wilo

dikin.»
«Bi me nakeve!»
«Dikeve, dikeve. Te xwe ji bîr kiriye ku em li Swêdê dijîn. Jiyaneke bi kurdewarî li vir derbas nabe, birako.»
«Lê ne weqasî jî.»
«Dev ji keçên kurdan berde. Tu serî li malbata wan jî digerînî...»
Rewşa Bişarê Luqmên jî heta ku bi Gulnaza neviya Circîs re nezewicî, wek a wan bû. Zewac jî Seydo pê kir. Jinika kurmanc Bişar berdabû û bi yekî efrîkî re zewicîbû. Îcar piştî ku jinikê ji wî jî zarokek çêkir, mêrik berda
75
û vê carê jî bi yekî taylandî re zewicî, Seydo ji dînê xwe derket û bi Bişêr de pijiqî! Jinikê birin û anîna zarokan bi haweyekî wilo li hev rast kiribû ku mirov tu carî nikarîbû xwe jê xelas bikira. Dema ku Bişar ji heftê carekê diçû ber deriyê wê û ji bo rojekê lawê xwe dianî mala xwe, ê efrîkî jî keça xwe dibir mala wê û li ber derî pêrgî hev dihatin. Seydo bi xwe pir zor anî. Ew yeka han wek heqaretek mezin bi kultura xwe re dît û ji bo guheztina Gulnazê bi Circîs re kete têkiliyê. Circîs qanih kir. Bişar jî piştî ku bi Gulnazê re zewicî û Gulnaz anî Swêdê, bi gotina Seydo rabû û rêya wê ji ser temamê dezgahên swêdiyan birî. Bi qeweta bêrîka xwe, ew ji kursan qut kir û ne hişt ku hînî zimên bibe.
Gulnaza ku mêrê wê ew kêmî tiştekî ne dihişt, mîna Sarê xwe girêdida û herwiha bi çavên wê jî li xwe dinerî, geh bi mêrê xwe re û geh jî bi zarokên xwe re li temamê

Swêdê û welatên Ewrupayê kurmanckî geriya, peyivî,
xwar û vexwar û da û stend. Civata kurdan li mala wê tevdigeriya.
Govend û reqsên kurdistanî li mala wê dibûn.
Televîzyona tirkî qedexe bû. Kasetên wan jî. Çi tiştê ku
navê tirkî li ser ba ne dihat mala wê. Heta bi zaroka wê a
heft salî jî stranên Gerebêtê Xaço û herwekî din digot.
Def, zirne, bilûr, ney, erbane, ribab hemû li mala wê
hebûn. Hindurê xwe bi tiştik miştikên kurdî xemilandibû.
Her derê hindur tije kitêbên kurdî bûn. Ji her pîrekê bêhtir
wê bi kurdî dizanîbû bixwenda û binivîsanda. Zarokên wê
jî. Mêrê xwe bi alîkariya nivîskarên kurdan re talan kiribû.
Li gora wê, nivîsandina bi kurdî hebûna kurdan diparast û
ji ber hindê jî nivîsandin li ba wê, di ser her tiştî re bû. Ji
wê komeleyê diçû komeleya din. Ji vê civînê bazdida
76
civîna din. Hofkeke kurdî li ku ba Gulnazê li wir bû. Jinikê
ew Bişarê ku di wextekî de bi şoreşgeriya xwe wek
mirovekî tirovirî di nav xelkê de dihat naskirin, bi qasî
çiyayekî bilind kiribû. Xwe jina malan, xatûna mendere û
qesrên axan û birêvebireke kultura kurdî didît. Kultur û
urf û adetên kurdî di wê de gihabûn hev. Gulnazê Xemlek
bû. Lê gava ku hat û xerab bû, xerab dibe.
Piştî ku ji xezûrê xwe Luqmên re nameyek bi kurdî
nivîsand û rêyî Nisêbînê kir, bi xwe hisiya ku bi kurdî
nivîsandiye. Li xwe xist. Lê ma fêde dikir. Bekçiyên ku li
postê her tişt saxtî dikirin, nameyê digihînin yuzbaşiyê
tabûrê. Yuzbaşiyê ku ji heftê rojekê hakimî li mehkemeya
Nisêbînê dikir jî, hema yekser berê xwe dide Zorava.

Wextê şîvê ye. Şîv li ber hemiyan e. Şîv li gora dilê Gulnazê ye. Girara bi sersipîk e. Û Luqman jî di nav wan de ye û nuh dest bi xwarinê kirine. Yuzbaşî bi eskerên xwe ve mîna wawîkan dadidin hindur û bêgotin cercûrê demaça xwe di serê Luqmên de vala dike. Piştî vê bûyerê, tisqa li wê Gulnaza ku mîna gulekê di nav berfa Stockholmê de serî hildabû ket; her bi wir de çû bi ser berfê de tewiya û tewiya û ji nişkê ve bi bahoza Swêdê re ber bi ezmanê Kurdistanê de firiya. Di wesyetê xwe de xwestibû ku wê li ba Sarê veşêrin. Lêbelê eskeran qebûl ne kirin û ew li Nisêbînê veşartin.

77

BEŞÊ SISÊYAN

1

Circîs bi kuştina Afatê stilîlî re, dîsa bû xwê û kete êgir. Xwe berizand zarokên xwe û careke din doza ku rahijin sîlehên dewletê û bi çekdaran re şer bikin li zarokan kir. Lêbelê kesî dîsa bi a wî ne kir. Piştî ku li wan şidand, wan jî ji bo çendeyekî xwe ji gund da alî. Bi çûna wan re Circîs dîsa rehet netebitî. Çû Midyadê; xwe gihand serkêşê pîberan û li ser ku birek peyayên wî texe gund pê re rûnişt. Serkêş axayekî ku bav û kalên wî hîn ji dema osmaniyan de zilamên dewletê bûn. Axê xwe da ber pazdeh pîberên bi zêc û zar. Circîs qebûl kir û nigdan vegeriya. Bi lez û bez xanî ji wan re tekûz kirin û li bendî ha wê hevalbendên wî bên û bên bê sebir sekinî. Piştî ku du hefteyek bi ser qewlê wan ket û kesek ne hat gund, bi rêya telefonê xwe gihand axê û ket qirika wî. Axa jî ji devjenga pê re

reviya û di a din î rojê de peyayekî xwe î ku nasê wî bû
rêyî gund kir. Digel ku peye jî gotina axê a dawî jê re got,
dilê wî dîsa ne ket cih.
«Apê Circîs, dev ji çûna xwe û Midyadê biqere. Tu
here jî bê fêde ye. Axê pir li ber qomandaran da. Lê ne bû.
Qebûl ne kirin. Û heta hinekî erza wî jî şikenandin...»
«Erê ji bo çi?»
«Ez çi zanim.»
«Ma ne qaşo mêrik delalîkê ber dilê wan bû. Torê ji
wan re fetih kir, Torê!»
«Pêşî pê dişêwirîn û yeka wî ne dikirin dudu. Lê ew
pêşî bû, apo...»
78
«Li Torê kurmancekî bi du qurûşan ne hişt. Û niha jî
guh lê nakin, ha!»
«Rast e, mêr di me de ne man. Lê ez hêvî dikim ku tu
bi vî rengî, bi wî re jî nepeyive. Binere heger esker bela
xwe ji we vekin, vê carê jî wê ew ê bela xwe ji we veneke
û êrîşa toriyan bîne ber devê deriyê te.»
Xwe aciz kir:
«Na na hema mineta wî jî li carê wî alî. Ma ne hey ne
bi qasî çawîşê Stilîlê mezin e.»
«Pêşî bi qasî generalekî mezin bû.»
«Lê niha?»
«Niha jî bi qasî eskerekî gotina wî li ba qomandaran
derbas nabe.»
«Ev e tirk, tirk wilo ne. Keysperest in. Li ber a xwe ne.
A wan heta ku girêka xwe bi pişt heçî xînin. Ma esker ên

ku mirov pişta xwe bi wan qewîn bikira!»
«Ew jî rast e, lê de ka em çi bikin, apo? Ma me neda dû Reyis jî? Belê. Lê qelp derket...»
Hîletê wî ji Reyis diçû û mêrik jî gotin anî bi Reyis ve girêda. Dîsa hat ser mijara berê.
«Min tiştek fêhm ne kir, wilo çilo ye? Ev qomandar li aliyekî doza pîberayetiyê li me dikin û li aliyê din jî rê nadin ku em pîberan têxin gundê xwe.»
«Wê ji min nepirse, ez xulam.»
Piştî vê hevdîtinê bi du rojan, dîsa rêya Midyadê girt.
Lê axê xwe ji ber vedizî. Circîs bi darî wî ne ket û polîpoşman vegeriya mala xwe.
Di wê navê re Reyis jî keft û lepta wî bihîstibû; mijar cidî girtibû û li ser sekinîbû. Reyis di vê kuştinê de, bi rastî jî ji bo ku ber dilê Circîs bigire, tiştê ku divabû bikira kir.
79
Lê Circîsê ku her gav bi çavê eskerê herî pîs lê dinerî, guh nedayê. Ma wê çawa guh bidayê? Heta ku dostê wî ê ezîz Afat ne hatibû kuştin jî, Reyis Afat û Yastar Elo «ajanên Mosadê» ilan kiribûn û di derbarê wan de propagandeke xerab meşandibû. Û bi ser de jî sê sîxurên ku destê wan ketibû xwîna Afat, bi «sed hezar mark û dolarên Afat» re dev ji Reyis berdabûn, hatibûn girtin û ji serî heta binî her tişt gotibûn. Circîs bi van hemiyan hisiyabû.
Sûcê Afat jî çima ku li nav tirkan dizî û xerabî dikir.
Metoyê ku xelkê herêmê navê wî kiribû Afat, bi rastî jî bûbû afat û temamê afata xwe bi ser tirkan de rijandibû.
Gundiyan ji bo ku kufletê xwe bi salê xistana, her sal di

mehên havînan de berê xwe didan Stenbol û izmîran û di avaniyan de kar dikirin û Afat jî diçû ew avanî dihedimandin. Deremêt dixistin bin avaniyên vala. Şekir diavêt nav benzîn û mazota terempêlan. Lastîk şîş dikirin. Lûleyên avê dişkenandin. Birkên avê qul dikirin. Camê dikanan ji hev belawela dikirin. Mal û pere didizîn. Jin dixapandin, mêr dişelihandin. Di kulekên qedemgehan re derbikên demaçeyên zarokan di serê du têlan re derbas dikir, diavêt hindur û dû re jî diçû radihişt cuzdanên wan. Guhên wî dilebitîn. Serê wî di xerabiyê de mîna seetê dixebitî. Lê digel wî haweyî jî bi qasî destbirakê xwe Yastar Elo jîr û zana ne dihat. Heta mirov dikare bibêje ku ne digiha toza wî. Ferqa wan a herî mezin ew bû ku Yastar Elo ji maldariyê nefret dikir û bi kîsan pere li ber êgir berdidan. Pere him ne didan kesî û him jî mîna Afat di xerabkirina Tirkiyê de bi qasî ku hevalê wî razî bûba, bi kar ne dianîn. Û bi ser de jî dişewitandin. Pereyên saxlem diqetand û bi ên qelp karê xwe dimeşand. Yastar Elo yekî wilo bû ku heta
80
dikarîbû ji çavên bûkan jî kil bidiziya! Afat ji sala 1966an de biryara xwe û afatkirinê dabû. Stilîlê gundê wî bû û li gundê xwe 'îlk okul' dixwend. Ew û Yastar Elo bi hev re bi kurdî peyivîbûn û kurdî jî qedexe bû. Mamoste her yek ji wan bi du wereqeyan ceze kiribû û bi ser de jî him têra wan li wan xistibû û him jî ew di «Oda Reş» de heta êvarê bê nan û av girêdayî hiştibûn. Li ser wê beleya ku hatibû serê wan, soz bi hev re dabûn û gotibûn «heta ku em sax bin, em ê ji xerabiya tirkan pê ve li tiştekî din ne fikirin.»

Dev ji dibistanê berdabûn, xwe li hînkirina xerabiyê şidandibûn û heta ku bûbûn xort, xerab fikirîbûn. Di sala 1982an de gava ku li Tirkiyê dest bi karê xwe ê dijwar kirin, herdu jî bi jin û zarok bûn.
Afat û Yastar Elo di salên dawî de bi qasî ku çekdaran ji xwe bidexisînin û Reyis jî tam bikin dijminê xwe, li Tirkiyê mesele mezin kirin. Bi mal û milkên sivîlan re vê carê jî berê xwe dan malê dewletê. Van herdu mirovên «edûtirk», ji xortên kurdên ku bi nav Tirkiyê de terqiyabûn, du-sê çete çêkiribûn û bi van çeteyan agir li tirkan dibarandin. Di her warî de xwedî imkan bûn. Destên wan digiha her derê û bi kîn destên xwe di her derê radikirin. Têrpere bûn. Pereyên ku li ba wan bi qasî axê pir bûn. Sîleh û cebilxane, êlekên polayî, terempêl û bi sextekariyê ve girêdayî dinyayek mohrên wan hebûn. Û Afat jî ewqas imkan di xerabiya li himberî tirkan de bêwestan bi kar dianî. Insan dikuştin, insan direvandin, otubosên belediyan, dikan, banke, daristan û hwd. dişewitandin. Pirên xewlecih deremêt dikirin. Bombe dixistin vargonên trênan, terempêl û bermîlên kewş û çopê. Xelkê Tirkiyê û bi taybetî jî ê Stenbolê di demeke kurt de bi kiryarên wan
81
re ji desthilanîn ket. Serî li polîsên ku nizanîbûn bê derb ji ku ve tên, geriya û nehişî bi vir de û wir de beziyan. Di dawiyê de ji partiya Reyis ketin xuşûşê û li her derê dest bi girtina alîgirên wê kirin. Reyis jî piştî ku di rojname û kovarên partiyê de berpirsyarê bûyeran Afat û Yastar Elo destnîşan kir, birek sîxurên xwe ên bijarte pevxistin û berê

wan da Tirkiyê. Sîxuran jî ji dil û can xwe danê û li erd û ezmên li Afat û Yastar Elo geriyan. Mafir, çend sîxuran li Izmîrê xwe gihandin Afat û bi dostayî xwestin ku bi rêya wî xwe bigihînin Yastar Elo jî. Lê ecele li xwe kirin û li bendî gepa herî xweş neman. Bi dostaniyeke maqûl Afat dan dû xwe û çûn Kadîfekaleyê mala yekî omerî. Xwediyê malê mirovekî navser bû. Rîha xwe di kar û barê kurdayetiyê de sipî kiribû; gelek caran hatibû girtin û mala wî di bin kontrola polîsan de bû. Mêrik ne li mala xwe bû. Jina wî a ku sîxur nas dikirin li malê bû. Sîxuran piştî ku di hindurê malê de Afat xistin çewêl, devê çewêl girêdan û dan ber kêran, çewal li wir hiştin û bi yek tûşê re xwe ji Izmîrê dan alî. Jinik behetî û kire hewar hewar. Polîs berî cîranan pê ve gihan û her tişt dîtin. Piştî bûyerê bi çend seetekî jî mêrê wê girtin û mezbete li ser mezbetê lê şidandin. Mehkemeyê jî li gora van mezbeteyan bi mêrik re kir û miebed ceze dayê. Ev mirovê ku di nav kurdan de wek kurdperwerekî mezin dihat naskirin, li girtîgehê piştî çar salekî bi nexweşiyeke pîs ket û mir. Bi mirina wî re partî jî lê xwedî derket; ala xwe bi ser tabûta wî dakir û ew li Kurdistanê li gundê Fafê veşart. Digotin ku çend çekdaran jî li ser gora wî, ji şerefa qehremaniya wî re çewalek fîşek berdabûn.

82

BEŞÊ ÇARAN

1

Di dawiya sala 1993an de rengê şer û pevçûnê yekser qulipî. Li çiyan bi haweyekî û li gund û bajaran bi haweyekî

bû. Li çiyan dest, ling, ser û guhên mirovan hatin jêkirin. Li gundan bi kevir û daran, derbên qezetoreyan û xinceran û li bajaran jî di hindurê malan de, li ber deriyê dikanan, di hindurê mizgeftan û sikakan de mirov hatin kuştin. Li çiyan kuştî binax ne bûn; li gundan bi rojan term li erdê man; li bajaran bi êvarkî re karmendên belediyê term rakirin goristanan; neşûştî, bê kefen, bê selewat û tekbîr, qîr û halan, terqîn û mela, bi dozerê veşartin. Ji balafiran bombe hatin xwarê, agir bi dar û deviyan ket. Agir li ruhberan lîst. Çiya di nav dûmanê de man. Insan perçe perçe bûn. Û bi insanan re teyrik û tilûr û teba jî şewitîn. Bêhna kelaxên zîvar zîvarî ji her derê çiyan fûriya. Insan di nav paletên tenqan de bûn nanik. Ji helîkopteran bi saxî keç û xort bi ser gund û bajaran de hatin xwarê. Bi derbên topan, zinarên herî asê hilweşiyan. Bi guleyên panzer û tenqan kolanên bajaran, bajar li erdê sekinîn. Mirovên jîr û zana di êşkencexaneyan de mîna pez hatin gurandin. Dezgahên ku di nav xelkê de wek bingehê demokrasiyê dihatin zanîn, di xwînê de fetisîn. Fermandaran av ji ser kolanên bajaran birîn û têlên elektirîkê bi damarên dilê xwe ve girêdan. Çawa xwestin wilo tevgeriyan. Kanalîzasyonan bajar genî kirin. Sûk paqij ne bûn. Li postexaneyan bekçiyan kar meşand. Li nexweşxaneyan dîsa esker û polîsên sivîl karê doktoriyê kirin.

83

Piştî ku komutan bi cilên sivîl di şûna walî, qeymeqam, hakim û sawciyan de û li belediyan jî zilamên wan rûniştin, vê carê jî di bin seroketiya mirovên guhbel û polîsên

sivîl de, li her gundê ku wêran ne bûbû hawe bi hawe komele, li her navçe û wîlayetê dîsa komele û buroyên partiyan vebûn. Li gundan berpirsyarê mafê insanan esker û ê daristanan jî bûn pîber û hemiyan jî insan kuştin û daristan şewitandin. Ji wan bêhtir kesekî behsa insaniyetê, heq û hiqûq, qanûn û edaletê ne kir. Û bi qasî wan jî tu kesî pê li heq û hiqûqê ne kir.

Eskeran li herêma Omeriya, Torê û Xerza çûna çiyê li xelkê qedexe kirin. Li herêma Botanê û derên din jî wilo kirin. Bi vê qedexê re li van herêman pez nema. Kîloya goşt bû bihayê zêr û peyde ne bû. Rez qeliyan. Mar û teba pir bûn û bi vir de û wir de kişiyan.

Di nav vê bahozê de çekdarên Reyis jî bi qasî ku xwe di qul û qulêran de veşêrin, qels ketin. Eskeran ji hin kurdên santore û kurdên ku çekdaran zikê wan êşandibû, komik bi komik xwe pev xistin, bi demaçe û kincên sivîl geriyan û li gora qinyata dil, li vir û li wir mirov kuştin. Lêbelê dîsa jî kuştina herî bi xof, «Sofîk»an kirin. Mîna keriyên wawîkan deh deh-bîst bîst ji vê malê xwe dadan mala din. Bi keleşkofan li kolanên bajaran geriyan û her kesê ku bêhna kurdayetiyê jê dihat, teriyeke «minafiqiyê» pê ve kirin, «zilamê Reyis e» gotin û bi haweyekî barbarane kuştin. Di şerê li himberî wan de, bi rastî jî çekdarên Reyis demeke kurt, baş li ber xwe dan. Xelk parastin. Kuştin û hatin kuştin. Lê piştî ku vekişiyan û meydan bi carekê ve ji sofîkan re berdan û sofîkan jî li xelkê tam şidand, vê carê jî koça mezin dest pê kir. Ji Nisêbînê heta

ku sofîkan mirovekî bûnisrî di hindurê malê de û li pêş
çavên kufletê wî ser jê ne kirin jî, karwanê koçê bi qasî ku
hin kolan bi carekê ve vala bibin ewqasî mezin ne bû.
Lêbelê bi kuştina yekî darî re ev koç giha bandevê.
Sofîkan, mîna malê mazatê kuştin pêşkêşî xelkê kirin û
gotin «tu çawa dixwazî em ê wilo te bikujin; ji xwe re rengekî
kuştinê hilbijêre!» Mirovê darî jî ji wan xwest ku
zarokên wî hemiyan ji hindur derxînin, xwe têxe nav
livînan, lihêfê bikişîne serê xwe û bê kuştin. Wilo kirin. Lê
carinan jî li mirovê ku wê bikuştana guhdarî ne kirin. Li
Batmanê keçek bi sebeba ku hinekî sêngvekirî û servekirî
derketibû sûkê, li ser rayên trênê girêdan û trênê jî ew
perçe perçe kir. Li Farqînê jî jinek avêtin tenûrê. Di nîvê
sûka Mêrdînê de jinek tena derpî gerandin û dû re jî serê
wê pelixandin. Jinik bi pantor bû. Li ber devê deriyê lîsa
Qosarê zendê keçekê kêr kirin. Keçik zendtazî bû. Li
Nisêbînê jî li çend keçên pazdeh-şazdeh salî wilo kirin. Li
kolan û sûkan keç û jin, di bin ebe û foteyên reşxeriqî de
mîna celadên giyotînê xuya bûn. Zarok, xort, zilam û pîr
bi kum û tizbiyan geriyan û dan selewatan.
Çekdarên Reyis piştî ku bajar bi carekê ve ji mirweta
esker û sofîkan re berdan, vê carê jî qeweta xwe li çiyan
dan ser hev û bi haweyê ku maka temamê xerebiyan pîber
bi xwe bûn, her roj êrîş birin ser gundên wan. Li himberî
vê yekê esker jî vala ne sekinîn. Digel pîberan bi wan re
him şer sincirandin û him jî di çiya û newalan de mayin
danîn. Çekdaran jî wek van kir. Di rêyên ku ji gundan derdiketin,
xaçerêyên çol û çiyan, çiv û zîvronekên sikakên

rezan de mayin danîn. Bi van mayinan gelek kes perçe bûn. Û pirên wan jî dîsa zarok bûn.

85

Di her êrîşa çekdaran de bi kêmanî deh-duwazdeh kes hatin kuştin. Ji herdu hêlan jî mêr diketin. Lêbelê zembelîlkên ku ji xwîna zarok û heywanan diherikîn, ji ên çekdaran û gundiyan jî pirtir bûn. Arpiciyên ku çakdaran bi kar dianîn, mîna topên osmaniyan, ter û hişk didan ber xwe û derûdor di nava êgir de dihiştin. Li gundekî Torê bi tenê ji malbatekê, bi yek carê re şazdeh zarok hatin kuştin. Çekdarên ku zarok di propaganda xwe a li himberî ronakbîrên kurd û tirkan de wek serweta welêt bi nav dikirin, bi şev girtin ser gund û dest bi dest bombe avêtin hinduran. Li herêma Botanê jî carekê bi komkujiyeke hîn ji vê mezintir rabûn. Lê ew bi haweyekî din bû. Doza aşitiyê li serekê pîberan kirin û li ser «bextê kurmanciya kevin» bext dan hev. Serek rê da wan û ew jî bi qeweteke giran kişiyan gund. Piştî ku çend dist goşt û girar xwarin, her yekî ji hindama xwe de li pîberan reşand û xwe dadan malên wan. Bi dû ku gund di xwînê de hiştin û reviyan, vê carê jî esker û tîm hatin gund. Esker û tîman jî zarok û pîrekên ku sax filitîbûn, kuştin. Termê hemiyan li meydana gund rêz kirin û agir berdan xaniyan. Digotin ku ji Tirkiyê û heta ji Ewrupayê jî gelek rojnameger li gund civiyabûn.

2

Ji çar aliyên welêt insanên ku agir li xanî û avaniyên wan, li mal û milk û mizgeft û Qurana wan dilîst, mîna gêrikan kişiyan Diyarbekirê, Tirkiyê û Ewrupayê. Çiyayî

bûn, deştî bûn, gundî û bajarî bûn. Di nav wan de axe, eşraf, beg, şêx û mela hebûn. Dewlemend hebûn. Ên ku
86
qet bi êşa birçîbûnê nizanîbûn, qirêj û gemar ne dîtibûn hebûn. Û hemû jî talan bûbûn. Çiya û newalên xwe, deşt û zozanên xwe, gund û bajarên xwe berdidan û bi dinyayê de diterqiyan. Ne malbatek û deh-duwazdeh hezar malbat, ne eşîrek û çil-pêncî eşîr, ne gundek û du-sê hezar gund, ne navçeyek û pêncî-şêst navçe bû. Kom bi kom, qor bi qor, pêl bi pêl û bêwestan dihatin. Ferman bû. Halan bû. Talan bû. Lêdan û kuştin bû!

Li Diyarbekirê dê weledê xwe avêt!.. Her derê wê tije insan bûn. Bi hezaran zarok di kuç û kolanên wê de ji nêza giriyan; bûn parsek û xwe avêtin hindurê malan. Kal û pîrên ku bi ser êşa xwe de dinaliyan, mîna kûçikan di nav kevnekotkên rizyayî de û wilo li ber çavên her kesî bi ezabekî pîs mirin. Bi deh hezaran gundiyên birçî û tazî xwe dan ber bedenê da bistirin. Lê stara çi!.. Ji qul û qulêrên bedenê her sibeh cendekên zarokan derketin. Dayik di bin lat û berqefan de zan. Deh çêbûn, neh mirin. Ji bîst dergûşan du-sê dergûş. Bi sermê re qerisîn, bi germê re fetisîn. Beden bi bedena wan re bû yek. Ew bedena ku bi stûnên tarîxa wan bilind bûbû û tîr û rimên imperetoran nikarîbû derbas bikira, gurzên fêris, betil û pêhlewanan nikarîbû çimekî wê bifiranda, topên kemalîstan nikarîbû qul bikira, mîna beretan li erdê pijilî. Vir bû goristan; goristaneke ku bûbû stara xwêniyan û di bircên wê re dergûş difiriyan çemê Dîcleyê. Zarok di kulekên tarîxa wê re

hatin xwarê û perçe perçe bûn. Ji her derê vê bedenê dengê
qîr û hewar û nalînan bi ser bajêr de bilind bû. Kortikên
çavên xatûnan ji girî, mîna newalan kûr çûn. Ruyê kezîreş
û kezîzeran zervedan û lêv çilmisîn. Çavên wan ên xumarî,
mîna ezmanê ku barana xwe dibarand, di nav reşaya
87
xeşîmeyên bedenê de çênî xuya kirin. Lê westiyayî, melûl
û melûl. Zarok hestî û çerm man. Li vir jî dan dû wan.
«Wey li minê! Haho li me bêkes û li me hêsîran!» Li wan
xistin, girtin û kuştin. Li vî bajarê ku tije kerxaneyên seyar
bûbûn, tîman li deriyê her kesî xist. Polîs, esker û tîman
jin û mêr her kes di êşkencexaneyan de şilfîtazî kirin.
Kuştin, birîndar kirin û avêtin çemê Dîcleyê. Termên
perçekirî di nav çopa bajêr de her roj hatin dîtin. Li ber
deriyê her dikanê, li ser her rêyê, di kuçên herî ronî û tarî
û di nava sûkan de esker û tîm sekinîn. Tenqan bajar
rapêçan. Panzêran duryanên rêyan zeft kirin. Erê!.. Vir
dilê Kurdistanê bû, zend û çepilên bakur, başûr, roava û
rohilat bû. Qiral û qeranan, padîşah û mîrekan li vir di berpala
memikên dîlberan de govenda herî mezin gerandibûn
û hikim li Mekê, Medînê û Qudsê kiribûn. Betil û pêhlewanan
ji vir xar berdabûn «Selefên Siwarên Kufrê» û di
çol û beyarên ereban de dabûn ber devê şûr û riman. Imperetorên
ku devê dinyayê diçirandin hêsîr kiribûn. Fêrisên
herî bi nav û deng, birêvebirên herî jîr û zana, alimên herî
mezin dîsa jî li vir bi dar ve bûbûn.
Erê!.. Vir wilo bû, îcar gelo li nav tirkan çawa bû?
Ne av û ne xwarin, tiştek di ber wan re ne digiha. Didizîn,

direvandin, bi şev diketin malan û devê xwe li ber her kesî xwar dikirin. Fêkiyên xerabe didanhev, çi tiştê ku bi navê xwarinê didîtin radihiştênê û dixwarin. Bajar di bin wan de ketibû.
Dilê dewlemendan pêşî bi halê wan şewitî, dû re ji wî dilî qetran herikî û pişta xwe dan wan. Ji her kesî bêhtir dikandaran nefret ji wan dikir; ji her kesî bêhtir xwediyên aşxaneyan erza wan dişikenad; ji her kesî bêhtir nanpêjan
88
ew ji ser tenûrên xwe diqewirandin; ji her kesî bêhtir eskerên ku nobet li ber deriyê firinan digirtin li wan dixist û ew diavêtin erdê.
Sêng û berên keç û jinan bê gokên zêran, qirikên qulingî bê morî û mircan, newqa zirav bê kember mabûn.
Xizêm, guhar, hingulîsk, bazin, xirxal û heta bi xelekên di tiliyên xwe de jî firotibûn. Bi zatorê, janazirav û tîfoyê diketin. Mirinê mîna tîm û eskeran, piçûk-mezin her kes dabû ber xwe. Rê û rêwanî di goristanan de ne mabû. Û temamê goran jî bê nav, bê kulîlk, bê rihan û gul û nêrgiz, şitilên dar û beran. Mirov li goreke neqişî, ya jî bi bend û dîwar rast ne dihat. Gorên hemiyan jî mîna cesedê wan bi erdê re bûbûn yek. Xêr û xêrat hatibûn ji bîr kirin. Heta bi şekirê etaran jî li ser tu gorê belav ne dibû. Mûlida çi? Nanê miriyên çi? Şîva miriyên çi? Heta bi terqîn û yasînên wan jî betal bûbûn. Heqê kefenekî bi kesî re tune bû. Hemû jî mîna miraran binax dibûn.
Erê!.. Vir Diyarbekirê bû. Lêbelê li bajarê Wanê jî wilo bû. Û heta belkî xerabtir jî bû.

Li zozanên Serhedê gundek jî li ser lingan ne hiştin.
Li kabên xwe dixistin:
«Ax ku hema min ji van zarokan re çengikek şekir, yan jî cûmek goşt, yan jî çend gez nanê sûkê peyde bikira! Lawikê min, vî şekirkî bixwe da ber dilê te bigire. Serê min bi gorî lawo, wey li bextê dêya te be, li min porkurê, lolo lawo!...»
Mîna wawîkên nav mayinên binya Zorava, bi ser Xwedê û pêxember de dizûriyan:
«Şêrînê ber dilê dêya xwe, ruhê min, tu ê bi kurtêlên bermîlên çopê nexweş bikevî! Bes wan qaşilê zebeşan û
89
wî fêkiyê genî bixwe!...»
Zarokan girtibûn her derê. Û ji her derê mîna cewrikên kûçik û çêlîkên pisîkan dengê nûze nûza wan dihat. Mêr bi jinê re, dê bi bavê re, xwuşk bi birê re, bira bi birê û xuşk bi xuşkê re, ji ber deriyê vê aşxaneyê ber bi deriyê a din de dibeziyan. Ew bêerz dikirin. Lê wan nizanîbû ku birçîbûn çendî zor bû! Birçîbûn bêexlaq bû, birçîbûn raperîn bû, birçîbûnê ew «şeref û namûs û exlaqê ku ji islama wan girtibû» nas ne dikir. Û heta bi Xwedê û pêxemberê wan jî bêminet dikir.
Xwe li ên bi qerewat digirtin. Qerewat remza medeniyetê bû. Wilo xistibûn serê wan.
«Ez xulamê te me çend qurûşekî bide min, da ez hinekî zikê van zarokan têr bikim; bila xêr û setqa sax û miriyên te be...»
«Siktir ol pîs terorîst! Kaprak adam!...»

«Qepraxê çi ez xulam! Ez derketî me, ez rebenekî
Xwedê me, ez bê kes û kûs im. Ma tu rewşa min nabînî!..»
Destê xwe lê radikir:
«Kûçik, tew hîn dipeyive jî!» digot û lê dixist.
Xwe li dikandaran digirtin û bi îske îsk stuyê xwe li ber
wan radidan:
«Ez di bextê namûsa te de, zarokên min xwas û şilfîtazî
ne!...»
«Biceheme, teres!..»
Jê dipirsîn:
«Lê lê jinikê, ma li ser çi hûn di van deran re derketin,
lê? De ka were pala xwe bide a min û bêje... «
Digiriya, porê xwe dikişand, li serê xwe dixist, dev
canê xwe dikir:
90
«Ah îcar ev ji min kêm mabû! Lo lo qewado, ji min
nepirse, nepirse!» digot û xwe ji ber çavan winda dikir.
A din pala xwe didayê û digot:
«Hinekan bombe avêtin hindurên me û bi dû wan de jî
hin hatin û agir bi temamê malê danîn. Aha ez û vê zarokê
bi tenê xelas bûn...»
Mîna ku kesî kes nas ne dikir, her yek ji aliyekî dinyayê
hatibû, ji hev fedî ne dikirin. Belediyê car carê bi
qemyonan nan belav dikir, hemiyan bi hev re êrîş dibirin
ser qemyonan. Li vir dîsa zarokên ku nan dipûrisandin, di
nav lingan de telef dibûn. Pîremêr û pîrejin jî. Ji bilî esker
û polîsan, bi kelbetanan jî mirov nikarîbû devê wan ji hev
vekira. Bi qasî ku çekdar ji Reyis ditirsiyan, ew jî wilo ji

hev ditirsiyan. Wan jî mîna çekdaran ji hev re ne dixwest û bi şik li hev dinerîn. Reyis mîna hewrekî reş bi ser mejiyê wan de nixumîbû. Wek ku cin ji hesin bitirse wilo jê ditirsiyan.
«Vî pîrê ku di nav van potikan de xwe bi ser hev de qijilandiye, pîber bû, nêzîkî wî nebe, ha!»
«Binere, lê binere, hefza xwe ji wî mirovê ku di devê wê berqefa tarî de rûniştiye, bike!»
«Çi kiriye, çi, çi?»
«Eskeran di mala wî de bi şervanekî re kurekî wî kuştibûn û partiyê jî ew xayin ilan kiriye.»
«Weyla, tew heta niha hîn saxe jî, ha! Ê ne ez ê îşev di ferşikê bin serê bavê wî. ..!»
«Kuro rebeno, ev kalekwîrkê ku li wê navê digirî, ne melê mizgefta mehela Qijlê bû, hi?»
«Keçê hişşş, dengê xwe neke, şervanan jê re digot 'Melaminafiq'.»
91
«Aaaa ew zilam, axayê eşîrê bû. Û ew ê din jî şêx bû.»
«Îcar ew çima ketine vî halî?»
Qewadên bajêr li vir û wir xwe dadidan wan.
«Ê ne te nedît kekê, bê min şevê din ew hirmeta han çawa dikila!»
«Te bi çiqasî kir?»
«Bi heqê xwarinekê.»
«Kêkê, ez ê du xwarin bidim ser...»
«Binere, li wê fistiqê binere, ew ya benqek pere ye ku em wê li stenbol û izmîran bifroşin...»

Tîman ji xwe re direvandin. Polîs di meqamê xwe û hindurê terempêlên dewletê de diketin ser zikê wan. Hemiyan jî xwe têkçûyî didîtin. Bi destpêkê re ji wan re gotibûn, hûn dê û bav û kalên me ne. Wan jî bi çavên dê û bavitiyê li wan nerîbûn û her tiştê xwe dabûn wan. Azadî xweş e, serbestî rûmet e, gotibûn. Bawerî bi wan anîbûn. Xelasî bê mal û can nabe. Mal û canê xwe jî pêşkêş kiribûn. Xwe bikujin! Xwe perçe perçe kiribûn. Xwe bişewitînin! Xwe kiribûn xwelî. Dev ji zêc û zarên xwe berdin!Dev jê berdabûn. Rahijin sîlehan û hilkişin çiyê! Hilkişiyabûn. Yek ji bo hemî, hemû ji bo yekî. Wilo kiribûn. Yek bi hemî û hemû jî bi yekî. Ketibû serê wan. Partî Kurdistan e. Kurdistan partî ye û partî jî Reyis bi xwe ye ji wan re gotibûn. Û ew jî hemû bûbûn bahola Reyis. Lê Reyis jî mîna cesedekî bû. Ne têhna jiyanê jê diçû û ne jî bêhna jiyanê jê dihat. Rewşa ku ketibûnê tiştek di bîra wan de ne dianî. Ji rojê ditirsiyan, lê ji şevê hîn bêhtir. Şevên bedenê bi qasî giraniya wê giran bûn. Bi reşaya êvarê re deng û rengê wan yekser dihat guhertin. «Wey li minê! Haho li me hejaran!...»

92

BEŞÊ PÊNCAN

1

Bi destpêka bihara sala 1996an re di şêl û tevgera eskeran de hin guhertinên cidî çêbûn. Di a Reyis de jî wilo. Cara heftan bû ku yekalî agirbest kiribû û bi ser de jî qeweta xwe a mezin li başûrê Kurdistanê civandibû. Piştî wê biryara wî, eskerên ku ji aliyekî ve zor dabûn koçê û ji

aliyekî ve jî li himberî çekdaran şer gurr kiribûn, mîna demên berê li herêmê dîsa bûn desthilatdar û li çiyayên herî asê dest bi avakirina qereqolan kirin. Dû re jî li gelek gundên herêmê hin gundiyên ku di wextekî de pîberayetî qebûl kiribûn û digel wî haweyî jî bi gundiyên herî nêzîkî xwe re berdabûn wan, hêdî bi hêdî anîn gundan. Lêbelê ev yeka han li hin cihan bi sînor kirin. Li gundên ku milk û malê derketiyan bi dest pîberan ve hatibûn berdan, her bi wir de çû şer sincirî. Li van gundan gundî mîna dewrên berê ji hev re derketin çiyê û bi sîlehên giran li ber hev pahn bûn. Li hêla Botanê, dijminayî di diruvê eşîretiyê de geriya û çend eşîr ketin ber hev. Lêbelê toriyên ku di demekê de bi mal û canê xwe ve hevalbendên çekdaran bûn û li ser wan tiştek di xwe de ne hiştibûn, di vî şerî de dîsa li her kesî ferq kirin.

Di salên ku dabûn dû çekdaran, birek ronakbîrên xwe kuştibûn. Çend kesên ku reviyabûn Tirkiyê, li wir jî ne stirîbûn û ji ber wan bazdabûn Ewrupayê. Dabûn dû wan.

Yek li Frensayê û dudu jî li Elemanyayê kuştibûn. Him kuştin û him termê wan nebedî kirin. Mirovê ku li Frensayê hûrhûrî kiribûn û avêtibûn lexemên qedemgehên

93

bajêr, ji bal întelektuelên tirkan ve mîna fîlozofekî dihat naskirin. Torî ji berê de wilo bûn. Xwe li ser hevalê xwe perçe dikirin.

Di sala ku Şêx Ehmedê Xiznî «Merqeda Tilmarûf» ava dikir, Kopoyê dêrî jî li sofiyên wan fesidîbû. Berê sofiyan garankî dabû nav mayinan û erdên mayinkirî bi cendekê

wan ji mayinan kiribû. Kopoyê serekê qaçaxçiyan ji hindama Dêrê û heta ku gihabû hindama Zorava, mayin ne hiştibûn. Li gora ku digotin, heger dilê axayê dêriyan bi halê sofiyan neşewitiya, erza Kopo ne şikenandiba û jê re ne gotiba, «teres, te torî qelandin!» Kopo wê ji Serê Kaniyê û heta ku digiha Cizîra Bota, erd ji mayinan safî kiriba. Reyis jî mîna Kopo a xwe di toriyan de dîtibû. Bi ser serfa wan vebûbû û gotibû:

«Bila torî hevalê min bin û mineta her kesî li çiyayê wî alî! Ez bi wan dikarim deh Kurdistanan xelas bikim!»

Ordiyek ji xortên wan dameziranibû û ordî li Kurdistanê belav kiribû. Lê di vê ordiyê de komutanekî torî jî tune bû; hemû çekdarên bê rutbe bûn. Piraniya sîxurên wî jî dîsa torî bûn. Qîmeteke mezin dida wan û karê herî bi xov bi destê wan dikir. Hemû kiribûn grûb bi grûb û mezinê grûban jî ji tirk û kurdên ku nizanîbûn bi kurdî pêk dihatin.

Toriyên ku di dewra Reyis a herî xurt de, bi kuştin û terqandina axayên xwe re axatî rakiribûn, tiştekî bi du qurûşan di herêma xwe de ne hiştibûn û dû re jî berê xwe bi hev vekiribûn, hevdu kuştibûn û ji ber hev û eskeran derketibûn, vê carê jî li ser ku xwe têxin çavên eskeran, li vir û wir li hev civiyan. Hesabê pereyan û talana mezin kirin û şêwir û mişêwira kuştinê gerandin. Hinekan destê

94

xwe heta bi Ewrupayê jî dirêj kirin û ji wir jî qeflek li xwe vehewandin. Hofkgeran ling ne xistin bin xwe û bi şev û rojê bi vir de û wir de lewlikîn. Di wê navê re eskeran jî

xwe kerr kir û guh neda bê ji welatên xerîbiyê kî hat û kê dixwest bihata. Torî di dûmahîkê de, bi haweyê şazdeh bendan derketin holê û bi qepera hev girtin. Bi arpicî, topên destpiçûk, xweşkêş û metilyozên ku eskeran xistibûn destên wan, hevdu hildan çiyê û repandin hev. Etlayî ne xistênê; bi şev û rojê bû qupe qupa wan û kulek di laşê hev de vekirin. Çiqasî şer bi wir de çû giran bû û ber bi Kercosê de kişiya. Di dewra axatiyê de jî li ser vê Kercosê her tim wilo şer bû. Li ser Kerboranê jî. Di dawiyê de kercosiyan pişta kerboraniyan şikenadin û ew di şikeft, xindeq û sarincên Heskîfê de hesirandin. Kerboranî teslîm bûn. Esker hîç têkilî şer ne dibûn. Bi tenê ji dûr ve li wan dinerîn, ewqas. Di vî şerî de, ji bilî mêran, gelek jin û zarok jî hatin kuştin. Êgir li xaniyan lîst, qesr û axur hedimîn û heta bi heywanên ku ne ketibûn zefta çekdaran jî telifîn.

Li hin gundên derdora Midyadê, agirê şer bi haweyekî din gêr bû. Serekê pîberên Midyadê piştî ku rêya bajêr ji ser van gundan birî û gundî bê erzaq û qût hiştin, bi koma xwe ve her ji çend rojekî ji ser vî gundî avêt ser gundê din û bi kîn li wan da. Gundiyan li dor mehekê baş li ber xwe dan. Lê piştî ku du mezinên wan, xwe bi kuflet ve kuştin, ên mayî jî bê şert û merc teslîm bûn û mezinahiya wî qebûl kirin. Vî mirovî di dema çekdaran de jî wilo dikir. Lê bi haweyekî din: Wî çaxî serekê «milîsan»bû û her ji çendeyekî êrîşa xwe dibir ser gundiyên ne milîs. Di asasê xwe de ne bi tenê wî cih guhertibû. Li herêmê ew kesên

ku di nav xelkê de welatperwer dihatin naskirin û ew berî her kesî bûbûn alîgirên çekdaran, dîsa ew bûbûn pîber û wan zilma herî mezin dikir. Wan pir kuştibû û talan kiribû; ew pir hatibûn kuştin û talan bûbûn.

Omerî jî ne kêmî toriyan bûn. Wan jî bi çere mere nizanîbûn. Gava li hesabê wan nehata, li ser gwêşiyekî tirî pêşî diranekî mirov radikirin. Di dewra axatiyê de li ser miştaxan, di hesarên tirî de hevdu ser jê kiribûn. Heger ne ji axayên wan bana, wê qira hev bianîna. Piştî ku eskeran destûra vegerê dan hinekan ji wan, hatin; bûn pîber û bi gundiyên ku di gund de pîberayetî dikirin re sêl sincirandin. Li Omeriya şerê kurmanciya kevin bi haweyekî din û pir jî pîs pêtî da. Mîna kûçikan li vir û wir xwe dadan hev. Herêmê têra wan ne kir û vê carê jî li bajarên tirkan di hev re firiyan. Hevdu di nav xwînê de gevizandin. Hatin girtin û kuştin û ji cihê ku lê bi cih bûbûn jî terqiyan. Gelek ji wan zave û xezûr û xal û xwarziyên hev jî bûn. Hema hema hemû jî xwediyê hev bûn. Bi jinan reha wan tam li hev geriyabû.

Li herêmê şêxek ne mabû ku têketa navbera şerê wan û keska xwe biçiranda. Eşîr rabûbûn. Heger hebana axa, wê diranên wan ji kokê de rakiribana û mîna zemanê berê, qoqê serê wan di nav benên rezan de biçikilandana. Heger kinêsa maqûlan ne hatiba vemirandin, wê maqûlan bi şîretan ew hedayet kiribana û li gora urf û adetên kurdan ew agir bitefandana. Şer, stûnên civakê li erdê rast kiribûn û civak ji terizê, berf û baranê re berdabû. Ji aliyekî ve çekdaran û ji aliyekî ve jî eskeran, çi kesên ku tesîra wan di

nav xelkê de hebû, kuştibûn û civak bêserî hiştibûn.
Di dawiya şerê xwe bi xwe de, pîberan herêma Omeri-
96
ya eskerkî li hev payê kirin. Paya mezin jî terî û sadiyan
girt. Di eslê xwe de heger çekdaran terî û sadiyên ku di
demekê de bêşa xwe kêm dabûn partiyê, bi xwe re ne kiribana
dijmin, belkî tu carî jî nebana pîber. Lê çekdaran li
talanê wan xistibû. Wan jî gotibû «heger talankirin be, ev
karê me ye» û li ba eskeran cih girtibûn.
Omeriyên pîber, di herêmê de bûn beraz û xwe dadan
rez û bexçeyên mîrate. Mîna toriyan di rêyan de sekinîn û
terempêlên hev saxtî kirin. Di gundên xwe de qesr û xaniyên
ku bêxwedî mabûn, li erdê sekinandin. Darên şînokan,
hejîr, guhîj û fisteqan birîn. Ew darên tûyên reş û sipî ku
her tûyek wan bi qasî gwîzekê mezin dihat, hema hema ne
hiştin. Rez û himyên ku ji ber afata eskeran filitîbûn jî,
wan qelandin. Dest avêtin goristanan û gorên kesên ku
wek dijminên xwe dizanîbûn, ji kêl û keviran kirin; bi ker,
qantir û bergîlan di ser wan re meşiyan û gor ji rêxa dewaran
re berdan. Toriyan jî wilo dikirin. Gora Elîkê Betê
belkî deh caran xerab bûbû û bi peran dîsa hatibû lêkirin.
Bîr, çal û sarinc ji keviran dagirtin. Birkên avê xitimandin.
Çalê, gundekî kevnare bû û ji vî gundî li dor sê sed-çar sed
salekî axayên wan axatî li herêmê kiribûn. Ev gund bi erdê
re kirin yek. Agir bi hindurê qesra axê danîn û heta bi alifên
hespên peyayên wî xerab kirin. Kevirekî destarkî î bi
qul di dîwarê hewşa axê de bû. Renga reng bû. Rişma
hespê wî bi vî kevirî ve girêdidan. Ji kevir û wir de curnekî

ku ji bo êmê hespê bi kar dihat hebû. Pîberan kevir û curn perçe perçe kirin û her perçeyek bi derekê de avêtin. Hewş li erdê sekinandin. Destarên birxul kirin toz û li ber bê berdan. Çend darên ku li tenişta qesra wî bi çiyê re bilind dibûn û tarîxa eşîr û axatiya omeriyan destnîşan

97

dikirin, ji kokê de birîn. Li Qurdîsa Eliyê Ehmed û Metîna mala Têhir jî eynî tişt kirin. Eser ji wê Çala ku bi him û gima gergerek, mêrxas û fêrisên omeriyan dihejiya, ne hiştin. Bapîran li vî gundî şêwir û mişêwira ku Atatirk fermana wan rakiribû, gerandibûn; bi dapîrên pîberên îro re ketibûn gevzekê û bi axayê xwe re binxet bûbûn. Aha ev pîber jî ji wî tuxmî bûn. Lê îro jî?...

2

Eskerên ku di tarîxa Kurdistanê de tu carî li çiyayê Cûdî û Herekolê ne bûbûn desthilatdar, bi xwevekişandina çekdaran re, di van çiyan de biryargehên eskerî damezrandin. Ji çiyayê Finikê dest bi avakirina qereqolan kirin.

Di vî çiyayê ku dibû çar çiq, çiqek ber bi Dihê, yek ber bi Şirnexê, yek ber bi Dêrşewê û çiqek jî ber bi Cûdî de dikişiya, esker bi cih bûn. Eskeran piştî ku pişta xwe qewîn kirin, kişiyan çiyayê Kêrêkiça û xwe dadan kiçiyên ku çekdaran ew şerpeze kiribûn. Vir bi haweyê xwe di hindurê hefteyekê de safî kirin. Dû re ji vir bi yek bezê xwe avêtin çiyayê Çirçiro û berê xwe dan Cûdî. Çekdaran digel çend gundên ku di xewlecihên çiyê de mabûn, di qûntar, berwar û geliyan de tibabê du hefteyekî li ber xwe dan. Hindik bûn û bi ser de jî tu qewet bi hewara wan ve ne hat.

Heger nan û av û cebilxaneya wan xelas nebûya, kî dizane, belkî jî bi wê qewetka xwe, bikarîbana çend mehekî li ber xwe bidana. Du sed û pêncî-sê sed çekdarî, bi sîh û pênc-şeş hezar eskerî re şer dikir. Bixwestana dikarîbûn xelas bûbana. Ne reviyan, xwe kuştin û xwe dan kuştin. Lê asas şerê mezin piştî vî şerî qewimî. Eskerên ku bide-

98

stxistina Cûdî re tiştekî zêde ketibûn çav xwe, ji dest xwe çûn û nehişî bi çiyayê Zêrnîke û Hêrîmya ve hilkişiyan. Lê çawa kilkişiyan wilo jî perçên goştê canê wan bi dar û beran û taht û latan ve zeliqî man. Çekdaran fen li wan kiribû. Herdu çiya jî bi Cûdî re ne dihatin wezinandin. Çiya mîna du girikan ketibûn çavên eskeran û çekdarên ku çend sed hevalên xwe di şerê çendek berê de kiribûn qurbana vî şerî jî, herdu girik yekser bi kemînan rapêçabûn û bêdeng hinavên xwe dixwarin. Hejmara wan li dor hezar û pênc sedî bû. Eskeran bi rohilat re xwe çeng kirin çiyê û ketin hikmê kemînên çekdaran. Lê çekdarên ku komutanê wan, taktîkeke Berzanî bi kar anîbû, dengê xwe ne kirin. Wan çiqasî dengê xwe ne kir, ev ên din jî ewqasî pê de çûn, bi çiyê ve hilkişiyan û ref bi ref li vir û wir belav bûn. Piştî meş û tevgera seetekê bi vî haweyî, ji nişkê ve ji tîmên ku di bestik û newalên çiyê û di bin taht û latan, hindurê şikerên kufarî û qurmê daran de bi cih bûbûn, agir pijiqî û hawêrdor çiya hejiya. Serî li eskeran geriya û çekdarên ku qaşo wê kemînên xwe bernedabana, lê germ bûn, mîna qertelan ji kemînan firiyan û xwe dadan wan. Komutanê wan ê ku heyranê Berzanî bû û xwe wek wî jî girêdabû,

di silûmê çiyê de bi çend hevalên xwe ve li ser pêyan
sekinîbû, ji vir bazdida wir û bi ser çekdaran de habela hildibû.
Ne dixwest ku ji kemînên xwe derkevin. Lê ji bîra
kiribû ku bêtêl di destê wî de ye û bêyî bêtêlê, serokhêzan
li dera han bihêlin, wê dengê wî ne çûbaya çekdarên di
kêleka wî de. Di dawiyê de li serê vî mêrkujê serhedî jî
xist û heta ku jê hat qêriya:
«Bijî serxwebûn û azadî, kurd û Kurdistan û şerê
meee! Bimire rev û teslîmiyet! De lêxin beranên azadiyê,
99
lêxin, ez çavên we bixwimmm!» got, dev ji emir memir
berda, dûrbîn û bêtêl avêt, bêsêrî daket û bi tivinga xwe ve
li ber eskeran veteqilî.
Lê di vê navê re jî ji çend çekdarên ku di ber re bazdabûn,
yek hate kuştin. Wî nav di xwe da. Keça ku hema li
binya wî bû, jê re lîland. Bi lîlandina xwe re jî ji nav çavên
zinêr çeng bû wê navê û bi keleşkofa xwe rikêbî ser qefla
komandoyan kir. Lêxistin. Wê dîsa lîland; kumişî û bi ser
darê de hate xwarê. Ev ê din ew dît. Piştî ku du bombe li
ser hev di wan werkir, dîsa nav di xwe da û li dora xwe
zîzbû. Herdu bombe jî li nav wan ketin. Vî jî mû ji Serdêr
bernedabû. Dema ku diteqiya, şer li ser girandibû û mîxferan
li hewa dilîst, ji mêraniyê kîsikê gunên wî bihustekê
vediziliya û li derdora xwe çeng dibû. Şer giran bû û çiqasî
bi wir de çû erd û ezman hejiya. Dîsa agir bi çiyan, car
û newalan ket û li dar û deviyan lîst. Top, arpicî, tematêk
û metilyozan pozê zinaran firandin û bi newalan de latên
herî mezin û cendekên lawên bavan gindirîn. Li hev germ

bûn û bi xezeb di hev re firiyan. Ji kelaxê esker û çekdaran cokên xwînê herikîn, xwîn rabû û her derê mîna kulîlkê sor veda. Balafir hatin. Û bi dû wan de hema ne bi gelekî, helîkopterên skoskî. Lê ne balafiran û ne jî helîkopteran dikarîbû tiştek bikirana. Esker û çekdar ketibûn nav hev û dest bi dest li ser hev dikirin. Hin eskeran jî tam mîna çekdaran çavên xwe ne digirtin û diçûn ser. Lê çekdarên ku xwîna xwe xistibûn kevçî, li hin cihan bi xinceran xwe di himbêza wan werdikirin. Bi vî rengî gelekan xwe da kuştin. Di vî şerê ku mirov jin û mêr ji hev ferq ne dikir, jinan çarhawêr dilîlandin; mîna mêran nav di xwe didan û bi mêran re xwe diavêtin ber devê çapiliyan. Ji van

100

jinan guliyên gelekan bi dar û deviyan ve man. Kişiyan û di hev re derbas bûn, vekişiyan û xwe dadan hev û di nava êgir de lîstin. Pitîtkên xwînê li hewa firiyan û bi ser lûleyên xweşkêşan de hatin xwarê. Bêhna barûdê, goştê şewitî û porê kizirî, hawêrdor fûriya û di bêvila keç û xortên nuhatî de giha hev. Xiliyan. Xwe bi ser hev de guvaştin, bi gezan çûn canê xwe, tilî di birînan rakirin, bi paçikan ber girtin, «bijî Kurdistan!» gotin û bi bombeyan ajotin ser çeperên eskeran. Ji çekdaran dengê hewar û nalînekê jî bê çî ye ne dihat. Birîndarê ku ne ê mirinê bû jî, fîşek di serê xwe de berdida. Lê eskeran ev yeka han ne dikirin. Pirên wan li erdê dinaliyan. Şerê bi vî haweyî, heta ku reşayî kete erdê jî dom kir. Lê di qada şer de eskerên ku wê li ber xwe bidana ji xwe ne mabûn. Li dor çar hezarekî ketibûn herdu çiyan û hemû jî ya hatibûn kuştin û yan jî birîndar

li erdê veketibûn. Lê heger komutanê çekdaran ne hatiba kuştin û wî jî wek çekdaran lê nexistiba, dibû ku hejmara eskerên kuştî û birîndar li pênc-şeş hezarî jî bisekiniya. Bi haweyê man û nemanê rabûbûn û bi qeweteke mezin hîn jî li ser lingan bûn. Asas govenda mezin dû re li dar diket. Pirên wan di şeran de pijiyabûn û bi ser de jî bûbûn reşkê şevê; wek gur lêdixist û hiltanîn. Şerê wan ê mezin wê bi reşayê re dest pê bikira. Wilo ji hev re gotibûn. Lê wilo ne bû. Li ser emirê ku ji Reyis stendin, bi reşaya şevê re cihê xwe berdan û bi lez û bez ber bi başûrê welêt de çûn. Li başûr hevalên wan, bi sîlehên xwe ên herî giran girtibûn ser Duhokê, gelek pêşmergeyên Partiya Miletê Kurdistanê û sivîl kuştibûn û di bajêr de asê bûbûn. Serokê partiyê jî temamê pêşmergeyan dabû dû xwe û berê xwe dabû bajêr. Çekdar bi wir de çûn pêşmergeyan û esker jî bi vir de hatin

101

û kişiyan ser zike gundiyan. Beşekî berê xwe da Hecî Beyriyan û beşek jî mîna berê çiya bi çiya ber bi hidûdê «Millî Mîsak»ê de çû. Hedefa wan a pêşî bidestxistina çiyayê Tenîna goyan bû. Ev çiya zeft kiribana, goyî ji per û bask dibûn û jê û pê ve her tişt wê bi hêsanî bimeşiya. Wilo difikirîn. Û wilo jî bû. Bîst hezar eskerek bêteqîn û şer bi çiyayên ku ordiyên herî mezin nikarîbû derbas kiribana hilperikîn û di newalên kûr re bihurîn. Bi haweyekî piştrast meşiyan, qereqolên seyar vekirin, li paş xwe ne nerîn û lezandin. Bi dû ku li keleha Gurkêlê tabûrek bi cih kirin, bi lez û bez bal bi Sênih ve dageriyan. Heta vir jî li tu çakdaran rast ne hatin. Îcar piştî ku li kêla Sipî ala xwe

çikandin û hemiyan bi hev re qederê seetekê ezman bi
dengê devziravan çirandin, çong berdan erdê û bi çadirên
xwe ve beziyan. Çekdaran ew erd wek namûs û şerefa
xwe dizanîbûn. Û wan jî di wê namûs û şerefê de singên
çadirên xwe kutan û hey kutan! Dû re jî komutanan deng
bi bêtêlan xistin. Çar seet ne ketin wê navê ezman hejiya
û helîkopteran mîna refên teyran xuyanî kirin. Refekî xwe
danî. Piştî ku xwe vala kir û rabû, vê carê jî ên din dor bi
dor kişiyan erdê. Çûn û vegeriyan. Dîsa çûn û dîsa vegeriyan
û ha ha xwe vala kirin. Lê di vê carê de barê wan, ne
ew bombeyên nepalim û jehrê, agir û barûda ku çekdar pê
dibûn qirik, jin bûn, bîra, şerab, raki, viskî û votka bû.
Vexwarin. Stran. Govend girtin. Ji ser xwe çûn. Qeliqîn.
Garankî rabûn. Hinekan xwe nîvtazî û hinekan jî xwe
şilfî tazî kirin. Xwe li hev pêçan, bi hev ve zeliqîn û hema
pê re jî ji çaviya kaniyên lewitî, pirik bi baxên bihuşta çekdaran
de herikî. Dû re jî li xwîna wan veda; xwîn bû kurmik
û kurmikan jî xwe li dar û devî û şînahiya Botanê
102
gerand û gerand!...
Li herêma Botanê, goyî û sindî di nav Hecî Beyriyan
de du eşîrên ku esker bi sergînekê jî ne dihesibandin.
Ertûşî, teyî, didêrî, kiçî, sipêrtî, zêwgî, giteyî, batûyî û
dêrşewî jî ne hindik bûn. Wan jî tu carî serê xwe ji eskeran
re dananîbûn û ne çûbûn eskeriyê. Piştî ku dabûn dû
çekdaran, ji bilî ertûşiyan, hemû jî bi haweyê eşîrî û civakî
ji hev belav bûbûn. Goyî ji hebûna tarîxa xwe de bi nav
û deng bûn. Ji toriyan ferqa wan a herî ber bi çav ew bû

ku him eskerî ne dikirin û him jî bi qîmetê kurdayetiyê dizanîbûn. Başûr û bakurê welêt ji hev nas ne dikirin. Her derê Kurdistanê ji bo wan bakur û başûr bû. Hidûd çi bû nizanîbûn. Dengê teqînekê ji ku derê welêt bihata, li wir diciviyan. Jinên wan di bin agirê balafirên erebên de dizan. Dergûşên pêçekan, refikên şikeft û berqefan bûn; qulên teban û qelîştekên zinaran bûn. Lîstikên zarokan mîxferên serê eskeran, fîşek, bombe û sarox bûn. Bi dengê top û metilyozan mezin bûbûn. Erê, wan goyiyan jî çiya û zozanên xwe berdan. Him jî çiyayê Tenîna ku dîsa ew goyî, sindî û ertûşî bûn, di vî çiyayî de cendekên osmaniyan gindirandibûn, bêqîr û halan berdan. Hin reviyan başûrê welêt, hinan xwe li Tirkiyê girt û qefla mezin jî derbasî Şirnexê û Qilava bû. Lê eskeran li vir jî dev ji wan berneda. Hin girtin, hin kuştin û beşekî mezin jî kirin pîber. Li hêla din jî ertûşiyên ku ji eşîra jîrikiyan, gewdî, mamxurî û qeşûriyan pêk dihatin, bi carekê ve ji desthilanîn ketin û wek pezê di bin kêrê de stuyê xwe ji qezetoreyên eskeran re radan. Eskeran jî mîna keriyên berazan gundên wan dan ber xwe, pê li her tiştî kirin û perçiqandin. Dû re jî di cihên herî stratejîk de qereqolên xwe ava

103

kirin. Mirov digot qey peymaneke bi dizî di navbera eskeran û Reyis de pêk hatibû ku çekdaran xwe ji çiyan dan alî; gundî ji cihên xwe terkûdinya bûn û her der kete destê eskeran. Li Botanê çemên xwînê herikîbûn û çekdarên wî bûbûn bazên çiyan. Heta berî ku çekdar têkevin herêmê jî bi hejmar, di wanqas çiyayên asê de bi tenê hew çar qereqol

hebûn. Ew jî li hin gundên ku di kêleka çiyê de ava
bûbûn. Ji çiyayê Finik, sinsila Cûdî û heta ku digiha çiyayê
Herekolê, Perwarê, Şaxê û Hîzanê, qereqolek li gundê
Melî, yek li gundê Hûsyanê, yek li Çêmanê û yek jî li
gundê Mêreyê bû. Lê bi reva çekdaran re her tişt hate
guhertin. Esker him bûn qertelên çiya û zozanê Botanê,
him dar û deviyên wê şewitandin û him jî çiya û zozanên
wê ji gundan xalî kirin.
Generalan piştî ku li rûtikê Hêrim qereqolek esker, li
xirbê Bestê, li çêlê Nimêja, girê Pihê û li besta Bêlejinê
tabûr û li Sêgirkê jî alayî danîn, berê xwe dan Cûdî û
Herekolê û di qûntara van herdu çiyan de kampên zivistanî
pev xistin. Kamp vala ne man. Ji her aliyê Tirkiyê keç
û jinên esker û dewlemendên tirkan xwe lê girtin û nehişî
xwe li ser berfa Kurdistanê bi vir de û wir de xijiqandin.
Eskeran hoperlorên herî mezin bi serê dîrekên herî dirêj
vekirin û mîkrofon dan destê muzîsyenên xwe ên herî navdar.
Û wan jî bi dengê herî bilind stira.
Di wê navê re jî Reyis derketibû televizyona partiyê a
bi navê Turksevê, kêfa xwe dianî û ji kurdan re digot:
«Ehmeqino, aha min cumhûriyeta we li Cûdî û Herekolê
saz kir! De herin ji xwe re tê de bigevizin, ha!...»
Ji bilî gelek koçberên li Tirkiyê, ji Elemanyayê jî çend
kesên ji Tora jor çûn. Lê çawa çûn?
104
Serî li konsulosxana tirkan dan û gotin:
«Em dixwazina di ser Tirkiyê ra biçina Kurdistanka
xwa û cemhoriyetka serokê xwa, ziyaret bikna...»

Konsulos jî piştî ku di ber xwe de hinekî bi aqilê wan keniya û ponijî, bê gotin mohreke silêmanî li peseporta wan a tirkî xist û ew ji nav çavên xwe bi der kirin. Heta ku gihan Şirnexê jî tu problemeke cidî bi wan re derneket. Di wê navê re herwiha ji kurdan pirsyana cumhûriyetka xwe jî ne ku ne kirin. Lê wan çi got, her ne ket serê van. Bi kurtî, eskerên ku di duryanê de terempêl saxtî dikirin, piştî ku ew birin tûgayê, bi rê de yek ji wan kuştin û bi lêdanê canê ên din nermijandin, hîn nuh bi ser hişê xwe ve hatin û bi xeberan belişîn serokê xwe.

Eskeran bi dû mehekê de ew rakirin mehkemeya Diyarbekirê. Lêbelê konsulos ket dewrê û ew ji wir berdan.

Vegeriyan Elemanyayê. Lê vê carê jî ji destê çekdarên sivîl xelas ne bûn. «Zimanê xwe dirêj kirin» û hersê zilamên navser di hindurê pazdeh rojan de nebedî bûn.

Di ser vê bûyerê re hîn mehek derbas ne bûbû, vê carê jî Reyis di Turksevê de ji a berê hîn xweştir got:

«Kurd miletekî welatperwer, qehreman, çêker û xebatkar e. Li Zapê cumhûriyeta ku min ji we re damezrandiye, pêwîstiyeke mezin bi keç û xortên we heye. Çekdaran du balafirgehên eskerî û yek sivîl qedandine û di a çaran de ji qiram ketine. Ev balafirgeh ji bo balafirên rêwiyan e. Rêwiyên ku ji Ewrupa û Emerîkayê diçin Kurdistanê. Ez hêvî dikim ku keç û xortên xwendekar û jin û mêrên ciwan, bi haweyekî xwe bigihînin newala Nesarayê da ji vir bi selametî em wan bi rê bikin...»

Çelq û pelq li kurdên temamê dinyayê ket. Û bi taybe-

tî jî li toriyan. Toriyên ku li Tirkiyê di qul û qulêran de bûn, bi zêç û zarên xwe ve û bi haweyê çend beşan rabûn ser xwe. Beşekî xwe li Nisêbînê, yekî xwe li Yûnanê û yekî jî xwe li keştiyên ku di ser behrê re derbasî Îtalyayê dibûn girt. Beşê ku ji Tirkiyê dihat Nisêbînê, eskeran li nêzîkî Meraşê sekinand û bi lêdanê da berhev. Piştî ku gelek kes seqet kirin û ewqase jî kuştin, ew vegerandin cihê ku jê hatibûn. Ji beşê ku di ser Yûnanê re derbas dibû, eskerên tirkan ji wan jî gelek kes girtin û kuştin. Kêm kesan xwe gihand Yûnanê. Ji ên ku bi qeyik û keştiyan diçûn, gelek kes fetisîn; gelek zarok nexweş ketin, mirin û di nav pêlên behrê de winda bûn. Ji hêla Serhed û Botanê, piçûk mezin li derdora deh-duwazdeh hezar mirovên ku li Colemergê gihabû ser hev û berê xwe dabûn Sûriyê, eskeran piştî ku bi girtin û lêdan û kuştinê ew ji qiram de xistin, berê wan da başûrê welêt. Li wir jî ne stirîn û vê carê jî xwe li Mûsilê girtin. Di dawiyê de çekdar bi wan ve gihan; li wan deran ji wan re kampek ava kirin û li ber dilê wan çûn û hatin.

Banga Reyis cihê xwe girtibû. Ji Ewrupayê bi sedan keç û xortên xwendekar gihabûn ber destê wî. Ji van keç û xortan gelek jê teknîkger, doktor û mihendiz bûn û hemû jî rêyî çiyê kiribûn.

3

Eskeran piştî ku di çiyê de çekdar ji derb xistin û çekdaran jî qeweta xwe a herî giran li başûrê welêt civand, hidûdê Serxet û Binxetê seraser di nava ronahiya elektrîkê de hiştin. Ji Serê Kaniyê û heta ku Cizîrê derbas dikir, rêya

hidûd xistin aliyê Binxetê binya şiva hesin û ji wir bi hêzeke mezin hidûd saxtî kirin. Saxtîkirina wan a vê carê qet ne dişibiya saxtîkirina berî şerê çekdaran. Ji bilî serhejmara eskerên qereqolên wek a Qesra ku du qatekî zêde kiribûn, gelek qereqolên din jî ava kirin. Li ber deriyê her qereqolê du-sê panzer, ewqase doc û cîp û tenqek-dudu sekinandin. Hejmara helîkopteran belkî ji a terempêlan jî pirtir kirin. Bi kurtî, herçi cebilxaneya ku li kolordiya Diyarbekirê peyde dibû, li van deran cih bi cih bûn.
Eskerên tirkan û erebên ser hidûd bi hev re ketin têkiliyê û li gelek cihan bi hev re tevgeriyan. Him jî darîçavên her kesî. Bi hev re li terempêlan siwar hatin, meşiyan, xwarin û vexwarin û ji wê qereqolê çûn qereqola din. Cîb û docên wan ji nav bajarê Amûdê û Qamişlê qut ne bûn. Lê digel vî haweyî çekdaran dîsa jî bi şev, komik bi momik li hidûd xistin û xwe gihandin refên xwe. Car carê li hev teqandin û carina jî bêyî ku li hev biteqînin, bêdeng derbas bûn. Piştî ku hin ronakbîr ji kurdayetiya wan ketin şikê û li Tirkiyê û welatên Ewrupayê li vir û wir peyivîn, wan jî kirin dengî ku li gelek cihan tunel çêkirine û di van tunelan re derbasî Serxetê dibin. Ji bilî wê jî gotin ku em ji Dirbêsiyê bi trênê xwe digihînin Nisêbînê û li hindama Bîrikan xwe jê diavêjin. Lê di trêna ku ji Dirbêsiyê de dihat jî her tim sê-çar mifreze eskerên tirkan hebûn û trên kontrol dikirin.
Li Binxetê jî sêl baş sincirî. Reyisê ku di wextekî de li vê herêmê jî temamê rêxistinên kurdan bi metodên xwe

têk biribûn, xelkê herêmê bi mal û can li dora xwe civandibû
û berê wan dabû bakurê Kurdistanê, qels ket. Xelk bi
refan ji dû vekişiyan û li mala xwe rûniştin. Lê piştî ku
107
mixaberatan li vir û wir xort xewle kirin û gotin ku ya tu
ê biçî eskeriyê û yan jî tu ê bibî endamê partiya Reyis,
cefil li xelkê ket û ji her derê herêmê mirov bi nav Sûriyê
û welatên Ewrupayê de terqiyan. Piraniya gundan vala
bûn û di şûna wan de dîsa hêdî bi hêdî û mal bi mal ereb
bi cih bûn. Li cihekî wek Tirbesipiyê ku paytextê axayên
toriyan dihat hesibandin, ji sê pişkan du pişk jê bûn ereb.
Li her derê Binxetê wilo bû. Binxetî bi mal û canê xwe
careke din têk çûn. Lê ev têkçûn qet ne dişibiya a di wextê
Mela Mistefa Berzanî de. Di wê têkçûnê de bi hezaran keç
û xort ne hatibûn kuştin. Kurd ji cih û warê xwe ne bûbûn.
Xizaniyê mîna hewrekî reş xwe bernedabû ser herêmê û
xelk li parsê ne hesilîbû. Dewlemendên kurdan bi ên
ermeniyan û filehan re ne reviyabûn. Êzîdiyan bi carekê
ve xwe li Elemanyayê ne girtibûn...
Li jêr rewşa kurdan xerab bû. Lêbelê li jor hîn xerabtir
bû.
Li jor esker bûn sermiyan û sersemiyanên her tiştî. Li
temamê gundan ronahî qedexe kirin. Gundiyên ku di
dewra qaçaxçiyan de perde didan ber paceyên xwe û şevbihêrka
xwe digerandin, bûn bi hesreta lempeyê, fanos û
çirayê. Di temamê rêyên ku diçûn gundan, navçe û bajaran
de sekinîn û bîst û çar seetan terempêl saxtî kirin. Saxtîkirina
pêşî bi haweyê lêgerîna sîlehan, çekdar û mehkûman

bû. Lê a niha bû sol û kinc û xwarin. Xwarin bi
mêzên û qapanê wezinandin; kîloya zêde qaçax dîtin û bi
hesabê qaçaxiyê mirov ceze kirin. Ceze jî di cihê cih de
lêdaneke pîs û qederê mehekê qûtkirina ji bajêr bû. Piştî
demekê êşkencexane jî bi vî cezeyî ve zeliqandin. Li
mirovên ku jê dexisîn kîlo giran kirin, birin êşkencexane-
108
yê û ji wir jî derxistin mehkemeya eskerî a li Diyarbekirê.
Mehkemeyê jî bi giştî ceze li wan birî. Lê cezeyê wan jî
ne bi haweyê li ser çend kîlo meqerna û birinca zêde yan
du qutîk rûnê nebat, derbasî ewraqan kir. Hin ji wan terorîst,
hin meyldarên terorîstan û hin jî alîgirên wan bi nav
kir û ew di girtîgehê de rizandin.
Eskeran bêhn ne dan gundiyan. Dosya gund û
«Hiqûqname»ya ku bi teqdîloyê nivîsandibûn, bi dest xwe
ve girtin, li nasnameyan nerîn û li gora Hiqûqnameyê bi
wan re meşiyan. Di Huqûqnameya ku ji çil û neh bendan
pêk dihat, gelek tişt hebûn:
«1. Her meh heqê her zaroka ku ji pêncan digihê dehan
kîloyek birinc, yek meqerna, yek fasûlî, yek goşt, nîv kîlo
rûn, deh nanê sûkê, sê sed gram çay, nîv kîlo şekir û pênc
kîlo sebze yan jî fêkî ye.
2. Lê kesê dema ku bixwaze ji dêvla tiştekî ve tiştekî
din bikire, bi hesabê ku bihayê wan li hev bike, karin bikirin.
Qanûn wî heqî didêyê.
3. Ji bo xortan, zilam û pîran her tişt du qatî lîsteya
jorîn e.
4. Her meh ji bo pênc kesan arvanek, heta bigihê dehan

arvan û nîvek û di ser dehan re, malbat çendî qelabalix
dibe bila bibe, du arvanan dikare bistîne.
5. Kinc û sol ji salê carekê, bi hesabê havînî û zivistanî
tên kirîn.
6. Doktorê ku ji bo te li vir sekiniye, te belaş divenirîne
û belaş dermên dide te. Derman ji kîsê Weqfa Mehmetçîk
e. Lê qanûn heqekî wilo jî layiqî te dibîne: Tu dikarî here
doktorekî din û dermanê xwe bistînî. Lê ji bîra neke ku
qanûn dest datîne ser wî dermanî û ji dêvla wî ji vir der-
109
mên dide te...»
Lê digel wî haweyî jiyan dîsa jî hêdî bi hêdî bi rê ve çû.
Heger di Hiqûqnameyê de bi navê nexweşiyan re navê
dermên jî hatiba nivîsandin û li gora rengê nexweşiyê derman
bihata bi karanîn, dibû ku jiyanê hîn bêhtir li xwe
bidaya. Derman asprîn, melhem, tentiryot û qetra çavan
bû. Yê virikê û qebzkirinê jî hebû.
Esker, polîs û tîm bi qasî ku dîndarekî misilman li jina
xwe hakim bibe, li gund û bajaran hakim bûn. Her tişt xistin
dest xwe. Ji temamê fihl û finasên ku berê bi dizî li
tevaya Kurdistanê dihatin kirin, tiştekî bi dizî nema. Tîm,
polîs û sofîkên ku berê li gundekî doktor, li gundekî çerçî,
li gundekî mela, mamoste, alîgir, milîs û çekdar bûn, xwe
heşkere kirin û li her derê pesnê xwe dan. Karê xefî nema.
Dîsa li her derê propaganda di derbarê bidestxistina kes û
kesan de rabû û di şûna wê de pere û devê tivingê cih girt.
Terempêlên eskerî her roj di kolan û sûkên bajaran de pê
li insanan kirin û perçiqandin. Di nava sûkan de bi haweyê

dawetên kurdan sîleh berdan. Cendekên çekdaran li Nisêbînê, Cizîr, Şirnex û Batmanê mîna pezên gurandî bi qemyon û docan ve daliqandin û li sûk û kolanan gerandin. Li gundan esker û tîm û li bajaran jî polîs û komutan bûn mêr û yarê hin keç û jinên herî sipehî. Keç û jinên xelkê ro li nîvro ji malên wan derxistin û ji xwe re birin. Û piştî demekê jî hin sax û hin jî kuştî bi ser mala bavê de şandin. Di wê navê re ne ku hinekan li ber xwe ne didan. Li ber xwe didan; lê wan jî di cihê cih de ew didan ber devê sîlehan. Li ser wê yeka han hema hema her roj keç, jin û mêr hatin kuştin. Ji bilî destavêtina keç û jinan, car carê dest avêtin hin xortên ku li xwîna wan keliyan jî. Ji

110

van xortan hin sax filitîn, bi dinyayê de terqiyan û çi tiştê ku bi serê wan de hatibû gotin. Li Nisêbînê, Batmanê û li Sêrtê li newala Qesaban cendekên hin xortên nuhatî di nav çopa bajêr de, kîr jêkirî hatin dîtin. Her ji çend rojekî mirov li nav goristanan, li qiraxa çeman, li xewlecihan û herwekî din li termê keçekê, xortekî rast hatin. Generalan wilo pê de anîn ku êdî xelkê kurdayetiya xwe bi carekê ve ji bîr kir û ji zik û namûsa xwe a beşerî pê ve li tiştekî din ne fikirî. Di tu heyaman de bi qasî vê dema ku çekdaran cihê xwe berdan û reviyan, zilm û zor û bêexlaqî nehat kirin! Kurdên bakurê welêt ji Atatirk û vir ve tu carî ewqasî ji per û bask ne ketin û rezîl ne bûn! Dîsa di vê demê de bi qasî ku esker û tîman pê li miriyên kurdan kirin, di tu deman de ewqasî pê li miriyan ne kirin. Bi refan xwe berdidan nav goristanan û kêlên ku bi nivîsên kurdî hatibûn

xemilandin, hûr hûr dikirin û bi dozerê gor bi erdê re dikirin yek. Gelek gelek gor windabûn.
Şer exlaqê insaniyetê têkbir û xizaniyê girt welêt.
Hema pê re jî nexweşiyê mîna hewrekî xwe da her derê û li vir û wir insan mirin. Dewlemend bi qasî ku li Bodrûm û Marmarîsê pasajên dikanan bikirin dewlemend û feqîr jî bi qasî ku li parsê bihesilin feqîr bûn. Tebaqa navîn rabû. Çiqasî bi wir de çû, çerxa civakê xerab geriya û kultur û exlaqê civakê têkçû. Qedandinî nema. Hevalbendî û dostanî li dîwarê pereyan sekinî. Her kes ma li ber a xwe û ji xwe pê ve li tiştekî din ne fikirî. Her kesî bi çavên kêzikê li xwe nerî û hişê xwe berda ser xerabiyê. Xerabiyê jî wek mîla pisûlayê berê xwe dayê û li ser textikê eniyê sekinî. Di vê xerabiyê de heta bi rivînên laşê wan jî bi hev re bûn dijmin. Rivîn ber bi hev de ne hatin, xwe li
111
hev ranepêçan û hevdu ne kişandin. Bi aqilê pevçûna xwe keniyan; mîna robotan bi gotinên desthilatdaran kirin û sûrafk di zikê hev de stiran. Mîna ku zelzele li hinavên wan rabûbû, her der wan diricifî. Mirov digot qey her kes bi tena serê xwe li vê dinyayê ye; yekî ne dixwest ê din bidîta û dengê wî bikira.
Çerxa zemanê Kurdistanê bi destên generalan geriya û zemanê wê bi qasî şerê li ser sênga wê bêexlaq bû. Bêexlaqiyê mîna xuya gur ji her derê welêt çirisand. Jar û hejar mal bi mal li parsê geriyan û bedena xwe di ber çengek savar, birinc û qedeheke rûn de firotin. Keç û jin bi pereyan di bin polîs, tîm û eskeran de raketin. Di qorzîbirên

bajaran de û heta li hin gundan kerxaneyên bê mohr û lewhe vebûn.
Şer kultura hezar salan da ber xwe û talan kir. Tiştek ne hişt. Şexsiyet bû wek tavên biharê. Qedir û marîfet bû devê tivingê. Hejêkirin bi tiştên herî sivik hat kirîn û firotin. Kêf û şahî û têgeha zewq û eşq û zewacê ji zimanê xelkê derket. Çemên ku ji goştên pevzeliqî diherikîn mexzena laşên mîna rojên nîsanê, ziwa bûn û ruhberên di hêlînê de bi çêbûna xwe re fetisîn. Bextxweşî û bextewarî bû xeyal. Hêvî bû toz û xwelî û li ber bê ket. Seyran û govend û dîlan ji gasînên gund û bajaran derbasî avaniyên polîsan, komutan û tîman bû. Dengbêj û hinermendên herî mezin li wir civiyan; muzîka herî xweş li wir lê ket. Stranên herî xweş li wir hatin gotin. Pêlên şehwetê ji wir bi ser gund û bajaran de hatin xwarê, xwe li çiyan xist û bi ser Kurdistanê de pijiqîn!...
112
BEŞÊ ŞEŞAN
1
Her tiştî mîna sehera sibehê nuh dest pê kiribû; teze, geş û xweş bû. Her tişt şên bû û ji mexzena kaniya xwe gulav difûrand. Jiyan tevdilebitî. Biharê bi gul û nêrgizên xwe ên rengareng deşt û çiya neqişandibûn. Tîrêjên rokê kişiyabûn erdê û di qûntarên çiyan de mîna çirûskên tenûrê diçirisandin. Teyr û tilûran xwe di xeml û xêza biharê de raxistibûn û di nav perên hewran de bi hev re şa dibûn. Şalûrên ku her yek ji wan mîna şahnekê bi ruyê ezmên ve xuya dikirin, li cihê herî bilind sekinîbûn û li

refên kevokên ku ji borangehan difiriyan, temaşe dikirin.
Bi şerqe şerqa baskên wan re erd û ezman direqisî. Gewdeyên darên ku koka wan bi erdê re bûbûn yek, mîna termên nav mayinan di nav pûş û pelaxê de vepelixîbûn. Û gîhê jî mîna ku sirekî veşêre xwe li wan rapêçabû û heta bi şaxikên herî piçûk jî nixumandibû. Sîha darên ku ji berqefên zinaran dikişiyan, gulgulî vedabûn. Bi hatina biharê re her tişt şiyar bûbû û bi lez tevdigeriya. Lêbelê şer û pevçûnê bêhn ne dida tiştekî. Kaniya di mêrga xatûnan de çikandibû, xwêhdana ku di cobarê memikên gurcên xezalan re diherikî û bêhna misk û emberê difûrand ziwa kiribû; rê li ber her tiştî girtibû û wek banga sibehê ku bi destpêka xwe re dawî li xwe dianî, her tişt dişewitand û winda dikir.
Nuh ji ser mezel hatibû. Lêvên wî mîna minminîkên ku xwe li ser kulîlkên daran datanîn, bê lept sekinîbûn. Xem û xeyalan mejiyê wî revandibûn. Bayê hêsîriyê di qehfûr-
113
kê serî de dixurbiland û mîna qurmekî rizyayî di cihê xwe de çûbû xwarê. Di ruyê wî ê reşxeriqî de, valahiyeke bêdawî xwe berdabû kortika çavên wî ên ku li hev qulipîbûn.Tayên rîhê mîna gîhayê ku di bin lat û rizdên zinaran de, bi şînbûna xwe re hêdî bi hêdî zer dibû û ne digiha dawiya biharê diçilmisî, kişiyabûn çongê. Êş û jana hinavan di destan de dabû der. Herdu destên xwe jî kiribûn kulm û bi ser hev de şidandibûn. Di salên dawî de kenê Hesoyê bûblanî di guhên wî de dengê teyr û tilûrên nav rez vedabû. Jîndariya ku di ruyê Sarê de gihabû hev, bi

qasî banga sibehê zewq dabûyê. Sarê roka zinaran û Heso
jî sîha kendalên xwe didît. Deng û reng û hestên wan,
mîna bêhna xuşîla ku mêşa hingiv ji dûr ve dikişand,
rapêşî mejiyê wî kiribû. Ew ji bîr ne dikirin, ji bîr ne dibûn
û wê ji bîr ne kiribana. «Wey mala min, kanîn ew roj!»
Dilê wî bi qasî ritilekê giran bûbû; mîna roka havînê hinavên
wî dişewitand û bi kul tevdigeriya. Xwe wek çûkê ku
di nav diriyan de asê bimîne, didît.
Hesûk bi dengekî lerizî jê re got:
«Yabo, her roj mirov tên kuştin; xwe ewqasî li ber pîrê
û kalo nexîne. Tu jî mîna me divê xwe hînî mirinê bikî.»
Circîsê ku jiyana wî bi a Zorava re şewitîbû û di destên
wî de bi tenê xweliya wê mabû, ricifî:
«Mirin ji bo insên rezaleta herî mezin û êşa herî dijwar
e! Lawo, ez nikarim xwe hînî wê bikim», got û mîna baranê
hêsir ji çavên wî hatin xwarê.
Perîxana ku wek dareke rizyayî li erdê vepelixîbû jî pê
re giriya û di ber xwe de bi dilşewatî avêt ser Reşo, Serdêr,
Heso û Sarê û sefaleta ku ketibûnê.
«Keçê bes bigirî û berzûrî Xwedê bibe! Ew xwedayê
114
ku dilê wî bi halê miletekî na şewite, îcar wê çawa bi halê
me bişewite, porkurê!»
Sekinî, kire niçe niç û henekên xwe bi aqilê wê kir:
«Ku dibêje ‘qey qedera me ye! Xwedê li eniya me
nivîsandiye.’A Xwedê çî ye, qedera hatiye serê me hemû
jî ji destê aqilê me ye. Em pîsitiya xwe nikarin bi Xwedê
ve girêbidin!»

Ponijî û vê carê jî wilo got:
«Ma ne mela dibêjin ku Xwedê li ebdê xwe tê rehmê û
tê xezebê. Xwedê dilê herî hişk nerm û ê herî nerm jî hişk
dike. Xwedê qewetê dide û distîne û mirovan dewlemend
û feqîr dike. Madem wilo ye, naxwe wî mala me viritandiye.
Erê Sarê, erê Heso, ma...»
Cidhan peyva wî birî:
«Xwedê, insan wek mêhfanekî xwe daye dinyayê.
Mala me dinyaya din e. Dinya ji Adem û Hawa û temamê
pêxemberan re ne maye. Em divê mirina wan qebûl bikin
da jiyan li me nebe merez.»
Circîs serê xwe rakir û bi haweyê ku Xwedê tiving berdabûn
Sarê û Heso û ew bi ser hev de kuştibûn, destê xwe
hejand:
«Tu rast dibêjî, lê qatilê herî mezin jî ew bi xwe ye!»
Dû re jî şiqamek li çonga xwe xist û bi kel û girî got:
«Îro jî pevçûbûn. Sarê pir bêhntengî xuya dikir!...»
Ştilên darên ku Circîs di ber kêlên Sarê û Heso de çandibûn,
bi a Kenêr û Keyo re qamekê bêhtir bilind bûbûn.
Lê dara Meyroyê wek jiyana wê, per şikestîbû. Mîna ku
Heso xwestibû ew veşartibûn. Keyo xistibûn navbera wî û
Sarê, Kenêr di kêleka wî de bû û kevirên gorên hemiyan jî
li hev disekinîn. Meyro gavekê ji wan dûr bû. «Heso li vir
115
jî dîsa ew ê berê» bû. Mezinahiya wî di deng û rengê dara
wî de xuya dikir. Çiquliyekî darê bi ser Sarê û yek jî bi ser
Kenêr de kişiyabû û xwe dabû ser hev. Mirov digot qey di
nav wan de her tim pevçûneke mezin heye, Sarê û Kenêr

a xwe lê kirine yek û Keyo jî xêrxwaziyê dixwaze. Şaxên dara Sarê û Kenêr ber bi a wî de dirêj bûbûn, bêwestan diricifîn û şerqe şerqa pelan bûn. Circîs wilo şerh dikir. Van mirovan, tiştên ku bi dû xwe de hiştibûn hemû jî hîn teze bûn. Dengê wan bi bayê ku di ezmanê Zorava de digeriya, hîn jî hêvî didêrand. Bêhna wan ketibû axê, li avê vedabû û Circîs jî ha ha jê vedixwar û xwe pê dişûşt. Belkî jî ji ber wê yekê bû ku hemiyan li ber çavên wî sawêr girtibûn û qet jê venedibûn.

Perîxanê li qûn rûnişt û wê jî bi hêrs a di dilê xwe de got:

«Kevjalo, te aqilê xwe berdaye, tu xurifî yî! Ji dêvla ku tu van kufiriyan bi rebê banî re dikî, bi a zarokên xwe bike da ev zir kufletê giran ji vê qiriktaliyê xelas bibe. Kuflet li taştêya sibehê, li firavîn û şîvê dimîne heyirî. Ne qût û ne arvan, tiştek di malê de ne maye; em li aziyê rûniştine. Ji destê pereyan me lawik ne bir ser textor û di nav destê me de mir!» û dîsa giriya.

Circîs di dawiya emrê xwe de, xwe wek mîha ku li derveyî kozê dima, bi tenê didît. Lê bi qasî zarokekî di pêçekê de jî şêrîn bûbû. Mîna gula ku nuh vedibû, bêhna dilpijokiya ber bêvilê jê qut ne dibû. Bi aqilê berberiya xwe û Heso û demekê, bi hevalbendiya xwe û Reyis û eskeran û bi feqîriya xwe dikeniya. Dev ji pîr û ciwanan berdabû û bi zarokan re dilîst. Ji jin û mêrên ku li hev ne dikirin re digot, «di navbera jin û mêr de a herî girîng hejêkirine.

116

Bêyî hejêkirinê hirmet nabe, ezbenî.» Hîn jî ew bêhnfirehê

berê bû. Û heta bêhtir jî.
Bi gotinên Perîxanê re hinavên wî keliyan. Neviyê wî ê neh-deh salî li besta gund, bombeyeke destan dîtibû û bombe pê de teqiyabû. Ji dest wan ne hatibû ku lêwik bibin ser doktor û lawik miribû. Mîna vî lawikî li herêmê gelek zarok bi mayin û bombeyan hatibûn kuştin.
«Lawê min destê xwe ji min bişon; ez li vê dinyayê nema bi kêrî tiştekî têm. Erê. Îcar lawo bar nekin û hûn çawa dixwazin ez ê bi a we bikim. Ez bi dû we de. Lê lawo doza ku em ê ji ser milk û emlakên xwe koç bikin, li bavê xwe nekin...»
«Em hemû bi vê koçê diêşin, lê de ka em çi bikin? Nabe ku em digel eskeran derkevin çiyê û zarokên xelkê bikujin. Cahşitî bi me nakeve yabo. Em jî wek her kesên ku bi nav tirkan de reviyane, li wan deran dikarin xwe bi himaliyê û bi vir de û wir de bidebirînin. Nabe ku em xwe di destên eskeran de bênamûs bikin», Hesûk got û keser li ser keserê vedan.
«Weyla lawo, bê çi bi namûs e kuro! Tu çima berê li vê namûsê ne difikirî? Ma ji vê bênamûstir tiştek heye ku mirov çavsoriyê li xelkê xwe bike. Dema ku çekdaran mîna heywanan li me dinerîn û li ser tiştê herî piçûk em cirm dikirin, digirtin û dikuştin, te çima dengê xwe ne dikir, şêro! Ma ew bêdengiya te ne bênamûsî bû qey? Her tiştek bedêleke xwe heye û dawiya bedêlê jî bi xelatan tê. Xelata camêriyê zêr û a çavsoriyê jî gule ne. Em divê bi tivingê herin ser wan.»
«Wî çaxî jî divê hema mirov, ceze bike, bikuje û ji her

kesî xwe dûr bixîne. Lê nabe.»
117
«Çi, çi, te çi got?»
«Mirov divê wek xwe bi insên re bike. Mirov bi dînekî re nikare bi dînitî tevbigere.»
«Lê hûn wek aqilmendan jî bi wan dînan re ne meşiyan, ma ne?»
«Her kes bi cezmê ketibû, mirov wê aqil bida kê û neda kê.»
«Rast e, mirov ne pêxember e ku di ber her kesî re bigihê û wî hedayet bike. Lê divê mirov bi xwe ne xericiya. We xwe ji wan xerabtir kir, xerabtir!»
«Yobo dem wilo bû. Heger me wek wan lê nexista ya em ê bihatana kuştin û yan jî mîna îro me ê ji gundê xwe bar kiribaya. Wekî din tu rê tunebû.»
«Yanî ji bo menfeheta xwe, me destê xwe bi xwîna xelkê kir. Tu vê dibêjî?»
Dengê xwe ne kir. Lê wî dev jê berneda:
«Bibêje lawê min, fedî neke bibêje!»
«Heger ne wilo be jî, dawî wilo derket», Hesûk got û serê xwe tam berda ber xwe.
«Na ew tiştekî din e, rast bibêje.»
«Erê, me her tişt ji bo xwe kir.»
«Ev çi ûjdan e! Ev çawa welatperwerî ye! Ez ê zarokên xelkê bikujim, ji bo ku zarokên min neyên kuştin. Ez ê malê xelkê talan bikim, ji bo ku malê min talan nebe. Ez ê vî û wî bixapînim, derew û bêbextiyan li wan bikim da ez têr û xweş bijîm. Yastar, yastar,

bêlome be, bêlome be, wax, wax!...»
Cidhan xwest ku ber dilê wî bigire.
«Yabo, Hesûk xurifî ye, nizane bê çi dibêje. Ma qey min jî ji bo menfeheta xwe dabû dû wan? Na. Ê min, ez jî
118
wek te xapiyam.»
Circîs gotina wî di ser guh re avêt; li zarokên ku li devê derî civiyabûn û bi ser dayikên xwe de dikirin mize miz, temaşe kir.
Dîsa çerçî hatibû gund. Lê ev çerçî ne ji wan çerçiyên demên berê bû. Barê wî ne hejîr, şekirê qulqulkî, qidam, benîşt û sabûn bû. Çerçiyekî ku kultura tirkan difirot. Her ji hefteyekê bi sindoqek kasetên teyb û vîdyoyan dihat gund û bi pereyekî avêtî dida gundiyan. Zarok hînî stranên tirkî kiribûn. Digel zarokan jin û mêr û heta hin pîr jî, bûbûn kewişiyê televizyonê û ji ber filîmên artîstên tirkan ranedibûn. Hema hema tu kesî êdî nema li muzîka kurdî guhdarî dikir. Çerçiyan gund û bajar dabûn ber xwe û ha ha ji vî gundî diçûn gundê din, ji vê kolanê xwe berdidan kolana din û karê ku pê rabûbûn tam bi cih dianîn.
Circîsê ku ji Hesûk hatibû bêvilê, bi ser zarokan de hilbû:
«Dîsa ew elafirinqê tirkan ha!» got û bi xezeb ji cihê xwe rabû, da devê derî û bi nav malan de teriqî.
Elafirnqê xwe li navtarê di nav koma pîrek û zilaman de zeft kir. Piştî ku ji pîrekan re got, «eskeran mêrên we ji zilamtî xistine, ew ji xwe fedî nakin. Ma hûn jî ji bav û kalên xwe fedî nakin ku hûn li stranên tirkan guhdarî

dikin!» û xwe li nav komê xist. Bi berstika elafirinqê xwe girt û ew da ber şiqaman:
«Namûsiz ewladî, erê çima yoqtir Şakiro, Meyremxanê, Bihemed Arifê Cizîrî!...»
Kulturfiroşê tirkî, bi vê xwerakişandinê behetî nema. Dizanîbû ku Circîs mîna eva niha wilo li çend hevalên wî ên din jî kiribû. Destê xwe li ber ranekir. Newêrîbû rakira.
119
Ji ber qûna qûna bû û di pişt zilaman de li ber xwe da:
«Apê delal, tu neheqiyê li min dikî, ez nanê xwe ji vî karî derdixînim.»
Circîs ji ser venekişiya. Lê zilaman jî xwe li mêrik kiribûn xelek. Circîsê ku li derveyî xelekê mabû û pehîn dadiwişandin vir û wir, hîn bêhtir qêriya:
«Lawê tirê tew kurmanc e jî, hi! Ê ne ez ê di wilo kurmanc...!
»
Bedran ji tara jor bi bez dihat.
«Apo, apo, mêrik mît e, mît, dev jê berde!»
Circîs vê carê jî berê xwe da wî:
«Kûçik lawê kûçik, madem pîsî ye, îcar çima hûn nêzîkî wî dibin û pîsiya wî di xwe de didin!...»
120
BEŞÊ HEVTAN
1
Dewletê piştî ku di sala 1926an de navê gundê Stilîlê kir «Akarsû nahiyesî», desthilatdariya gund bi destê başçawîşê qereqolê û midîrê nehiyê ve heta sala 1970î berda. Dû re dewletê midîr rakir û her tişt sipart başçêwîş.

Başçawîşên ku ji Stilîlê mezinahî li omerî û bûblaniyan dikirin û axa û maqûlên wan di nav destên xwe de wek şimayê diperçiqandin, heta dewra telebeyan jî serpozka potînên xwe ji ser devê xelkê herêmê ranekirin. Digel ku reyisê belediya Stilîlê wan bi xwe hildibijart, dîsa jî kar û barê nehiyê bi dest wan ve bernedidan û her tişt bi haweyê eskerî dimeşandin. Lê piştî ku telebe derketin, rêxistinên kurdî saz kirin û bi gundiyan re berê xwe dan qereqolan, li navçeyan yuzbaşiyan, li wîlayetan generalan û li nehiyan jî başçawîşan him dev ji çavsoriya xwe berdan û him jî bi carekê ve destên xwe ji nav karê belediyan kişandin. Wê yeka han heta salên 1980î jî dom kir. Îcar piştî ku eskeran li Tirkiyê derbeya eskerî çêkirin, heta sala 1984an jî hema hema li her derê herêmê başçawîş û yuzbaşî mîna demên berê bûn desthilatdar û ji berê pir xerabtir pê li xelkê kirin. Lê bi derketina çekdaran re mirov dikare bibêje ku heta dawiya sala 1993an jî, mezinahiya herêmê careke din ji dest eskeran derket û derbasî destê çekdaran bû. Ji bilî karê dewletî, her tişt wan bi rê ve bir. Xelkê herêmê di destê wan de, hinekî ji dil, hinekî ji tirsan misixur bûn û xwe dan bin barê herî giran. Bingehê tiştên ku ava bûn yan jî ên avakirî xerab bûn, hemû di van heft-heşt

121

salan de bûn. Di van heft-heşt salan de çi aqilê ku di serê birêvebirên xelkê de bû, ji eskeran xuyanî kir; hinera rewa ku di beyarên sênga xelkê de bû dîtin û fêhm kirin bê wê kengî di binê curnê wan de bang bidin. Tiştên ku xelkê di hindurê heftê salekî de bi neperûşkan dabûn ser hev, bi

hingama esker û çekdaran re di van hevt-heşt salan de belav bû. Lê piştî ku eskeran di herêmê de qeweta xwe a berê bi dest xistin, vê carê jî bi navê kurdayetiyê tiştek nema. Îcar tam di vê demê de Circîs jî li himberî eskeran serî rakir û di gundê xwe de li ber xwe da. Li ber xwe da lê tiştek jî di xwe de ne hişt! Bi liberxwedana wî re, felaketa ku bi ser Kurdistanê û kurdan de hatibû, hemû li gundê wî civiyabû. Ji hew bêhtir şerpeze bûbû! Rewşa wî û Zorava bi her haweyî dişibiya rewşa Kurdistanê û miletê wê. Li Zorava wî av ji bin erdê derdiket. Pembo, genim, ceh, nîsk û gelek tiştên din dihatin çandin. Bîstan, rez û bexçe hebûn. Li qelaç û çiyayên wê bihar kabokekê diket. Heywan bi xwedî dibûn. Li nav dar û deviyên wê teba digeriyan. Teyr û tilûr difiriyan. Qebqeba dengê kewan ji çiya û newalên wê xalî ne dibû. Êzingvanan êzing dikişandin malên xwe û difirotin bajariyan. Çal, bîr û kanî hebûn. Koçer dihatin şikeftan. Ma kê pincar dixwar. Tolik, xerdel, harik, şaqithilû, strîzerk, sersipîk, pîrqelaçk, xîlok, qîvarên cûr bi cûr, pîvok û kereng hebûn. Li nav erdan bi xernûfê ve heshesûk mîna gwîzan dadiliqiyan. Gunkavirk, şaqil, gwîriz û kurum şîn dihatin. Kurum dibûn qurmik û pîrekan ew di tenûran de bi kar dianîn. Gundiyan ji kaş û dimdiman dûvberank ji bin erdê derdixistin. Ji nav deviyan kumik didan hev, dixwarin û difirotin nisêbîniyan. Ew çiyayên ku bi rengê bêrîvanan, endeko, nefelê û kulîlkên

122

biharê dixemilîn ji dest Circîs çûbûn û hey çûbûn. Her tiştê wî hebû lê ne xwediyê xwe û tiştekî jî bû. Du-sê

terektor û texsiyên wî li devê derî bê benzîn û mazot sekinîbûn.
Û bi ser de jî ne kesî wêrîbû bikiriyana û ne jî wî bi
xwe karîbû perçe bi perçe bifrotana. Komutanan dest
danîbûn ser. Sê-çar hezar donim erdê wî hebû, lê nikarîbû
biçanda. Ava ku ji bin erdê derxistibû qedexe bû ku bi kar
bianiya. Bi tenê hew telefona wî ne birîbûn.
Circîsê ku navê başçawîşê Stilîlê kiribû Izrayil û ê yuzbaşiyê
Nisêbînê jî kiribû Israfîl, bi çûn û hatina Izrayil û
Israfîl ji derb ket. Izrayil ji heftê carekê xwe berdida gund,
li wî û gundiyên wî dixist û diçû û Israfîl jî bi dû de dihat
û yeko yeko xaniyên gundiyan bi deremêt û bomban dihedimand.
Rojekê dîsa Izrayilê wî ê serxweş ji dêvla ku biçûya
Menderê û li Circîsê menderî xista, tevlihev kir û berê
xwe da Circîsê zoravî. Piştî ku li ser bênderan têra wî
lêxist û herdu jî bi rastiya meselê hisiyan, Circîs xwe bezandê
û jê re got:
«Ez di jina wilo Izrayilî ...im ku nikare du Circîsan ji
hev nas bike!»
Digel ku eskeran bi pêlêkirina xwe Circîs kiribûn wek
kevjalekî, kesayetiya wî têk ne biribûn. Ne ruhê wî silûk û
ne jî dilê wî ji pevçûna bi wan re sar bûbû. Car carê nav di
xwe dida:
«Ez Restemê Zalê me lê gurzê min tuneye!»
Vî mirovê ku bi qeweta kînê xwe li ser lingan digirt,
her çiqasî xwe bi dest zarokên xwe ve berdabû jî, dizanîbû
bê çi dikir û wê çi bi serê wan bihata. Koçê mîna marekî
xwe berdabû ser dilê wî. Her ku dihat bîrê, bi kulman bi

sênga xwe diket. Bûbû wek demaçeyeke dagirtî û habela
bi xwe de diteqiya.
Başçawîş û yuzbaşî bi êrîşên xwe, Zorava xistibûn
diruvê girtîgeha ku eskeran digirt ser û girtîgeh bi darê
zorê ji girtiyan vala dikirin. Ew Zorava ku di wextekî de
mîna gulekê bêhn dida, çilmisîbû û bi lez ber bi dawiya
xwe de diçû. Zorava sar bûbû. Rojên wê bê hizûr û bêhnteng
bûbûn. Şevên wê bi xof bûn! Her kesî xwe mîna girtiyên
ku di binê zinadanan de zincîr kirîbûn, didît. Mirov
digot qey vir dojeh bû, tiştekî xwe nikarîbû jê xelas bikira
û her tişt dişewitî. Zemanê wan mîna marê ku di reşayê de
bê serî disûrikî, ber bi behrên bê binî de ha ha diçû.
Wehşeta ku eskeran li vî gundî kiribûn, bi şevê, ji wehşeta
ku resamên herî bi nav û deng derbasî ser qertonan dikirin,
bêhtir xuyayî bû. Li ser bênderên wê êdî xortan nema
bi lûlik, gokê û çirê dilîstin. Ne zilaman xwe li ser repinên
wê vedizilandin û bi richa û damê dilîstin û ne jî bi şev
dengê zarokên ku di navtarên wê de, bi tûştê û xezalê
dilîstin dihat. Erzêl û textên bajarî ji ser xaniyan rabûbûn.
Ji wan textên çîtkirî ku di bin zeriyan de mîna hêlanê dihejiyan,
eser ne mabû. Ew bîstanên ku Zorava mîna giravekê
radipêçan, tune bûn. Di bin holikên wan de, keç û xort
bi hev re rûdiniştin. Awir di hev difirandin û bi awiran re
hisên wan ên qedexekirî digihan bandevê. Hevdu digevizandin
û bi dest, lep û pê û gezan xwe dadidan hev. Herdu
hêlan jî destên xwe li ser cihên herî eyb digerandin û ew
zewqa herî mezin di cihê herî eyb de keşif dikirin. Mîna
ku araq berdidan nava hev, erd bi ezmên re dibû yek, her

der li ber çavên wan dihejiya û bi ser hev de dixiliyan. Kê li urf û adetên bav û kalan guhdarî dikir! Fedî û eyba çi!
124
Li ber gidîşan û lodên pûş xwe zer dikirin hev û mîna teban hevdu di erdê didan. Ji gevzekên wan babîsok radibûn. Di nav biharê û geniman de, xwe li hev dipêçan. Bi xunava ku ji wan laşê gewr û boz dibariya, biharê şîrik digirt, geniman simbil didan û bîstan dikemilîn. Memikeke wan xipşên zinaran sêv, yek jî hinar bû. Ji yekê gez dikirin a din dimijtin. Û dû re jî xwe çeng dikirin deqa di hindurê kilora zikê ku bi nîvişkê danê sibehê seyandîbû. Ka ew Zorava! Di nav rengê hêsîriyê de dişewitî. Bi şevê û heta bi rojê jî, dengê insanan mîna ku ji hicreyên girtîgeha Diyarbekirê dihat, melûl û melûl bû. Şer şexsiyeta gund yekser guhertibû. Lê ew çawa şexsiyet bû ku di hikmê çend salekî de hatibû guhertin? Kultura ku bi sed salan di serê insanan de meyabû, çawa dikarîbû di wextekî ewqaskî kurt de, biqusiya? Qusiyabû.
Ji ber êrîşên eskeran, Mîrzoyê ku digot di nav xwarina tirkan de jehr, di nav vexwarina wan de zîro, di nav livînên wan de mar heye, reviya Izmîrê. Hema bi dû wî de çend malên ku Circîs berî kuştina Heso û Sarê xistibûn gund jî, bi nav tirkan de çûn. Ji malbata wî jî çend mal çûn. Du-sê malên ku man jî bûn pîberên bi mehaş û li derbaskirina xwe geriyan. Pîberan ne tahde lê kirin û ne jî guh danê. Piştî ku Circîs û malbata wî bi tena serê xwe ma, vê carê jî yuzbaşî bi qutkirina telefona wan re, çûn û hatina Nisêbînê, Mêrdîn û Qosarê jî li wan qedexe kir. Bi vê biryarê,

malbat di hikmê mehekê de ji hawhaw ket û li têrkirina zikê xwe heyirî. Îcar tam di van rojên teng de Yastar Elo wek Xocê Xizir bi qemyoneke erzaq bi hewara wan ve hat û bêmefer xwe dada gund. Qemyona xwe vala kir; rêya ku wê Circîs çi bike û çi bibêje da ber û nigdan berê

125

xwe da Mêrdînê. Qemyona dewlemendê qubalî di newala Qutê werkir, li motorsîkletê xwe siwar hat û di hilm û pifekê de xwe gihand Diyarbekirê. Li wir jî li balafirê siwar hat û rêya Stenbolê girt. Bi çûna wî re Circîs jî aqilê ku wî dabûyê da zarokên xwe û bi lez û bez tevgeriyan. Zarokan pêşî Cidhan berdan çaleke ser bênderên jora gund; di hindurê çalê de ser nixumandin û devê çalê vekirî hiştin. Çala avê bû, hatibû xitimandin, lê dîsa jî tibabekî kûr bû. Dû re di hikmê nîv seetekê de sergoyê binya qesrê kolan û li derdora pazdeh-bîst telîs birinc, birxul, deh-pazdeh kîs ard û ewqas jî tenekên rûn di bin zibil de veşartin. Dû re jî wek nimûne, hema hema bi qasî ên veşartî li wê navê rêz kirin û li bendî ha kengî wê Atîlla bigire ser wan, rûniştin. Pênc seetek ne ket wê navê, Atîlla bi garanek eskerên xwe ve hat û nehişî xwe avêtin hindurê malê û axuran.

«Circîs axa, ma tu dizanî ku Eloyê ezîzê ber dilê te vê carê jî xwe kiriye şûna min, ha!» Elo mohr û îmzeya komutanê tugaya Mêrdînê û îmzeya wî bi xwe, li mezbeta ku ji bo Circîs nivîsandibû xistibû û qemyon di bin kontrola qereqola Qesra re derbasî gund kiribû. «Mêrik, xwediyê qemyonê û dikandarên Mêrdînê xapandine, qemyon

li dev kiriye û bi hewara te ve hatiye. Te çi kiriye ji mêl?
Mal ne ev bi tenê ye, bi xweşî derxîne!»
Circîs piştî ku gotinên Elo di hişê xwe de hemû li hev
civandin, bi hosteyî jî gotin bi dû hev de rêz kirin:
«Erê tu rast dibêjî. Elo bi dolarên sexte qemyon dagirtibû.
Xwe berdabû Qosarê û mal li kolanên koçberan
belav kiribû. Ev ji me re anîn.»
Atîllayê ku xwe hînî kurdî kiribû û bi qeweta kurdî di
126
karê xwe de bi serketî bûbû, sist bû. Da aqilê xwe, bêhnekê
ponijî û bi kurdî got:
«Circîs axa, vê meseleyê ji bîr bike. Erzaq ji we re. Û
heger ez û tu em li hev bikin, li ser namûsa xwe sûnd dixwim
ku ez ê qedexeyan bi carekê ve jî ji ser we rakim û
gund bi deste te ve berdim. Pêşî ez dixwazim ji te fêhm
bikin.»
Ne zimanê wî û ne jî marîfeta gotinên wî pê ecêb hatin.
«Kerem bike bibêje.»
«Baş e. Gava ku ez bi temamê miqedesatan sûnd bixwim
û soza mêrên berê bidim te, tu ê ji min bawer bikî?»
Circîs ew baş nas dikir. Li hin cihan gelek carî wilo
kiribû û li ser a xwe ne mabû. Him li ser a xwe bima jî,
dîsa pê re ne dikir. Bêdeng ma. Wî eynî gotin dubare kir.
Circîs ziq li herdu çavên wî nerî û bi hêdîka got:
«Qomandar, di vê rewşê de ez ê nikaribim baweriyê bi
te bînim.»
«Ez te fêhm dikim, wilo ye, wilo ye. Lê ez ê dîsa a xwe
bibêjim: Bi tenê hew ez dixwazim vî Eloyî bibînim bê

mirovekî çawa ye. Ji bo vê dîtinê ew çi ji min bixwaze ez ê wê bikim. Jina min di kerxaneyê de be ew ku bixwaze ez ê kesî bi xwe nehisînim û herim wir. Circîs axa, bibe nabênhatî.»

Circîsê ku Yastar Elo ne bi malê dinyayê û ne jî bi tu mêrî diguhert, lerizî û hema pê re jî gotina xwe a dawî got: «Ma mirov dikare têkiliyê bi cinan re deyne, bi wan re rûne û wan zeft bike? Ew cin e!»

Atîlla ne hişt ku zêde bike. Destê xwe misaskî di zikê wî rakir, «wilo ha», got û çavên xwe li nav koma esker û kufletê wî gerandin.

127

«Circîs! Ez Cidhên nabînim, li ku ye?»

«Ji doh ve çû ye Cizîrê ser textor.»

«Tu rast dibêjî?»

«Erê, erê...»

Xwe aciz kir, bi rîha wî girt û bi ser hilbû:

«Ma ne min bajar li we qedexe kiribûn! Hûn çawa...»

«Rast e, rast, lê qomandar beg, te Cizîrê li me qedexe ne kiribû...»

Atîlla dev ji devjenga pê re berda, ji hewşê derket û li pêpîka xwe xist. Esker lê civiyan.

«Zû wan tiştan hemiyan bînin vir, mazotê bi ser dakin û agir berdênê!»

Piştî ku eskeran emrê wî bi cih anîn, «ji vir û pê ve temamê bajaran li we qedexe ye», got û bi rê ketin.

Yastar Eloyê lawê Kenêr, bavê xwe li toza xwe hiştibû.

Di derbarê xerabî û avakirinê de tu kesî nikarîbû lingê xwe

li ê vî Eloyî xista. Kêfa Kenêr ji mêraniya Eliyê Şêr re
hatibû û navê wî kiribû Elî. Lê lawik ji Eliyê Şêr bêhtir bi
ser wî ve çûbû. Tiştê ku serê insên ne dikişand, ê wî dikişand.
Tiştê ku mirov bîr ne dibir wî bîr dibir. Û cesareta ku
li ser wî, belkî li ser Eliyê Şêr jî tune bû. Ji elektronîkê jî
fêhm dikir. Elektronîka li bazarê mîna hevirmêşê di destê
wî de li hev diqulipî. Taybetmendiyeke wî e din jî ew bû
ku dengê kurdî û tirkî di qirika wî de civiyabû. Dikarîbû
neqla her kesî bikira. Yekî wilo bû ku geh xwe karîbû bikira
serokwezîrê Tirkiyê, elektirîk û av bianiya gundan, geh
xwe bikira generalê kolordiya Diyarbekirê bi hakimê
mehkemeyê re bixeyidiya û bi bavê xwe re pênc-şeş gundiyên
belengaz ji girtîgeha Diyarbekirê berda. Geh dibû
komsêr, geh general, geh profesor... Tibabek xortên kur-
128
dan bê imtîhan derbasî unîversîteyê kiribûn.
Di sala 1979an de dîsa xwe kir serokwezîr û bi telefonê
piştî ku a xwe bi ser a midîrê Dewlet Su Îşlerî xist û
erza wî şikenand, îmzeya serokwezîr li ewraqan da û jê re
şand. Midîr di hindurê sê mehan de av anî çend gundên
derdora Kercosê. Piştî ku dîsa bi eynî metodî rêya wan
gundan da çêkirin û bi ser de jî elektirîk kişand gundan,
taxên pereyan ji axan stendin, hemû şewitandin û vê carê
jî berê xwe da hin axayên derdora Farqîn û Bismilê. Av û
elektirîka wî heta ku eskeran ferman li herêmê ranekirin jî,
gundiyan bi kar anîn.
Yastar Elo bi pereyên pêxwasiya xwe dikarîbû temamê
herêmê bi xwedî bikira. Lê ne dikir. Car carê bi hin kurdên

metropolan û Kurdistanê re alîkariyek bi haweyê lixwekirinê, xwarin û alavên malê dikir. Lê piştî kuştina Afat dev ji wê jî berda. Hîletê wî ji pereyan diçû. Têrpere bû û bêpere bû; çawa dihat destê wî wilo jî dişewitand. Li gora wî pere dijminê insên ê herî mezin bû. Pereyan ruhê insên silûk dikir; insaniyeta ku bi hezar salan pê re gihabû hev dikuşt û li gora xwe isaniyeteke qelp çêdikir. Divabû insan bi pereyan bilind û nizim nebûya. Hejêkirin, qedir û qîmet, hebûn û nebûn û camêrî bi pereyan ve ne hatiba girêdan. Dêya wî çar rojan ketibû ber pîrikan. Dinyayek qolinc û êş kişandibû û bavê wî jî ji destê pereyan dê ne biribû ser doktor. Di halekî pir xerab de zabû û ew anîbû dinyayê. Dê şaht bûbû, nexweş ketibû, nexweşî li canê wê geriyabû û di dawiyê de jî pê çûbû.

129

BEŞÊ HEŞTAN

1

Seydo bi berberiya xwe re li hatina xwe a Swêdê jî poşman bû û li vegera xwe sebibî. Lê li herêma wî kevir li ser kevir ne mabû. Eskeran heta bi teyr û tilûrên welatê wî jî bi dinyayê de terqandibûn. Civak serûbinî hev kiribûn û kultura wî têk biribûn. Zimanê bav û kalan gihandibûn xetera mirinê. Cîlekî tirke-kurd ketibû rê. Mîna zarokan digiriya. Qîma xwe bi zilma eskeran, girtîgeha Diyarbekirê û êşkencexaneya tûgaya Mêrdînê dianî. Li wir hema çawa ba dîsa jî liberxwedanek hebû. Mirov êşkenceya herî pîs didît. Lêbelê mirov a di dilê xwe de jî digot û bersiva xwe bi lêdanê, girtin û kuştinê distend. Bêhna mirov derdiket.

Lê li gora wî li Swêdê ew jî tune bû. Mirov mîna kûçikan dikarîbû heta sibehê bireya; lê kesî ne tiştek dida mirov û ne jî li mirov dixist. Her û her wek xwe dikirin. Seydoyê ku axîn dikir xwîn, têkiliyên xwe bi Aydin re xurt kiribûn û ji bo vegerê pê re dikir cire cir. Aydin hevalê wî bû, lê ne hevalê şer bû.Wî gandîwarî dixwest. Lê mîna Gandî jî qet tevnedigeriya. Bi tenê digot û hew. Sînan, Restem, Silêman û Bişar jî ne hevalê şer bûn. Ji Aydin re digot:

«Me nîvê emrê xwe li vî welatî derbas kir. Tu pîr bû, lingan bide ber xwe, wilo nabe!»

Bi rastî jî Reyis Aydin pîr kiribû. Ji destê wî ro ne didît. Him kitêbên kurdî dinivîsandin û him jî di kitêban de li têkbirina Reyis û xelasiya miletê kurd digeriya. Ji aliyekî ve bêbextiya hewa Swêdê, ji hewa wê re «Reyisê swêdî»

130

digot, û ji aliyekî ve jî pêstûriyên Reyis ew ji taqet xistibû. Çermê laşê wî bi qasî ê çêlkewekî tenik bûbû; serme tahmûl ne dikir. Ji bilî nexweşiyên wî ên din, hema hema ji mehê du-sê caran bi bapêşê jî bû. Li gora wî jî sîstema Swêdê insanê bi rûmet bêrûmet dikir û şexsiyeta herî mezin pûç û vala derdixist. Tew ew ji ezmanê wê jî aciz bûbû: Ne roka wê, ne baran, ne berf û bayê wê dişibiya a welatê wî. Aydinê ku ji xwe bêhtir şibiyabû Circîs, pir li ber xwe diket. Tiştekî wî ne mabû û dîsa jî ji ser a xwe ne dihat xwarê.

«Nabe, hîn şert ne stewyane, Seydo. Heta ku Reyis têk nere, em ê nikaribin herin welêt. Li cihê xwe rûne û dev ji

vê donkîşotiya xwe berde! Bi sebir be, hîn jê re divê. Ew roj nêzîk e...»
«Aydin tu qediyaye, lê hîn jî têhna te heye. Digel ku li temamê Ewrupayê çend komikên piçûk li dora te mane û ev komik jî mîna ronakbîrên tirkan li doza kurdan temaşe dikin, dîsa tu xwe binketî nabînî. Li xwe vegere û xwe bide ser hev...»
Di dawiyê de Aydin qanih bû û ji bo çûna welêt tevgeriya. Lê du mehek ne ketin wê navê, Aydin xwe kuşt û Seydo dîsa bi tena serê xwe ma.
Ji vî lawikî re hîn ji destpêkê de xerab ketibû.
Li qelêç û bê pîrik çêbûbû. Zarokên hevalên wî bi ser lingan ketibûn û ew hîn jî bi çarlepikan diçû. Çar salî bû, dûpişk pêvedabû. Şeş salî bû, bi tîfoyê ketibû. Heşt salî bû, berên poş lêxistibû û ji mirinê rabûbû. Di deh saliya xwe de ji dara tuyan ketibû û serê wî li ser movikekê çiriyabû. Û gelek gelek tiştên wek van bi serî de hatibûn. Piştî ku bûbû xort, vê carê jî Reşo ew bi doza kurdan ve girêda-
131
bû û ew ji nav vî agirî li nav agirê din qelibandibû. Kêfa wî ji pevçûnê re ne dihat û hîletê wî ji sîlehan diçû. Lê Reşo bi darê zorê ew kiribû sîlahşorekî ku çavên xwe digirt û fîşek berdidan. Her ji çendeyekî wê polîsan ew bigirta, çend rojekî di nezaretxaneyê de têra xwe lêxistana û berdana. Lê asas a ku ew pir êşandibû keça Erol Efendî bû. Dil ketibû keçikê û keçikê jî hevalekî wî kiribû. Digel ku hevalê wî bi zanatî ew zewac bi siltana wî re kiribû, dîsa jî xwe ji hevalê xwe ne xeyidandibû. Bi tenê jê re

gotibû «ehmeq, ma mirov bi evîna hevalê xwe re dzewice? Mirov jina hevalê xwe tîne?» Seydo ji kurdan û tirkan pir kişandibû. Di dawiyê de tiştek wek wî ne bûbû, «em kurd miletekî ku ji xwe fedî nakin. Miletê ku bêvila wî ji bindestiyê neşewite, her tiştê xerabe heq kiriye», gotibû û revî revî berê xwe dabû Swêdê.

Ji aliyekî ve xwekuştina Aydin û ji aliyekî ve jî rewşa Bişêr ew ji hal de xistibû. Bişêr bi mirina jina xwe re aqilê xwe berdabû, swêdiyan ew rakiribûn nexweşxaneyê û zarokên wî jî bi tenê mabûn. Zarokan exlaqê wî şibandibûn ê dêya xwe û pê ve bûbûn dirdirk. Wî ji zarokan û zarokan jê hez dikir. Pir li ber wan diket. Karê wî mabû bi wan ve. Aydinê hevalê wî, di bin deynê kitêbên ku bi kurdî nivîsandibûn de mabû û şûşeyek kezab vexwaribû. Mirina Aydin, xeyalên wî bi carekê ve têk biribûn. Lê dîsa jî tiştek bi qasî êşa ku Reşoyê Sarê dabûyê, ne dihat. Dema ku li çiyê bi darî Reşo ketibû, Reşo xwe jê aciz kiribû ku çima şûşek-du şûşe bîra yan jî şerabek filan jê re ne biribû. Di dilê wî de mabû û pê re bûbû kul. Reşo ji xewnên wî dernediket. Û heta bi roj jî, sîha wî ji ber çavên wî ne diçû.

Seydoyê ku xwe binbarî wî didît, di dawiyê de bû

132

hêsîrê xewn û xeyalên bi wî re û ji qiram de ket. Piştî dît ku heger bi haweyekî xwe negihîne Reşo, wê bi nexweşiyê têk here, rêya Sûriyê girt û rast berê xwe da Qamişlê ser tirba wî. Lê destvala jî ne çû. Bîst kase vîskî, bîst votka, bîst şerab û pêncî jî kaseyên bîrayê kirîn. Hemû cihê cihê vala kirin çar bîdonan û di seeta ku çûbû civanê wî de, li

dor seet dehê şevê hevdu dîtibûn, bivir û xilçek bi xwe re hilanî û çû ser gora wî. Ser gorê ji hindama serî de qederê metreyekê kola û ewqase alkhol berda devê Reşo. Lê hemû ne bi carekê ve. Heta ku fereca sibehê lêxist pê re rûnişt, pê re vexwar û kul û derdên xwe ji hev re gotin. Ket. Lê kesî ew ne dît. Li dor nîvroyê şiyar bû. Bi kel û girî xatir jê xwest û dîsa da ser wê rêya ku di biyanistanan de li ronahiyê digeriya.

133

BEŞÊ NEHAN

1

Qiçqiça germa havînê ye. Tîrêjên rokê di ezmanê Omeriya de rast kişiyane erdê. Hewa bi qasî ku pitikên tozê ji çol û beyaran raneke giranbûye. Taht û lat sincirîne. Rivîn ji erdê radibe. Teyrik û tilûran xwe dane bîn sîdaran. Marên teyar har bûne û bêwestan xwe dadidin ruhberan; di hev re difirin û mîna werîsan xwe li hev badidin. Helke helk bi teban ketiye. Zimanê kûçikan bihustekê kişiyane. Beraz û wawîkên ku girtine her derê çiyê, xwe berdane ser çem û kaniyên gundên wêrankirî. Newala Qurdîsê tije beraz bûne. Wawîkên li şewlên Gurik û nav gundê Zivingê, Hatxê û Qûzo ber bi ava Şêxbat de dibezin. Beraz jî. Refên beraçemkan di şikeftan de xwe dane ser hev û ji ber pisîkên berrî bi vir de û wir de difirin. Bêhna termê çend zarokên ku dohtira rojê, ew jî bi nexweşiyê miribûn, ji nav goristana Zorava bi aliyê gund de difûre. Pîrekekê xwe avêtiye ser gora yekî ji wan û hewar û hewara wê ye! «Lo lo berxo, li min nemayê, bila bimire mala zilm û hêsîriyê!...

»
Tên! Ji rêya Nisêbînê ber bi Qesra ve tên. Mîna ku dereng mane, pir xurt diajon û tên. Miheqeq dîsa wê bigrin ser derekê; lêxin, bikujin, destbiavêjin keç û jinan, bi xwe re bibin qerargehan, zarokan bi saxî têxin nav êgir, her tiştî talan bikin û bişewitînin. Qereqol derbas kirin û bi ser rêya Stilîlê de dageriyan. Tîm in, esker in. Docekê daye pêşiya cîbê û sê docên din jî bi dû cîbê de ne. Ji ala ku bi şîşa wê ve liba dibe, xuyaye ku yuzbaşiyê tabûra
134
Nisêbînê tê de ye. Circîs hilkişiyaye ser qesra xwe, li wan û li helîkopterên ku ji aliyê Nisêbînê ve tên temaşe dike. Ji hêla çiyê ve jî dengê helîkopteran tê. Lê Circîs wan nabîne. Zoravî bi hinduran de dibezin. Zarok diqîjin û bi xwe de dimîzin. Her kes ditirse, lê tirsa tu kesî jî ne bi qasî a zarokan e! Zilam hêkên hesinî dikin. Xwîn li dayikan vemiriye û xwe li zarokan rapêçane. Hersê-çar malên pîberan ketine hev. Ew ji ên din jî bêhtir ditirsin. Terempêlan ji ser rêya Stilîlê xwe berdan Zorava. Cîrcîs bi lez ji ser qesra xwe daket:
«Romiyan girt ser me, romî! Romî tên! Lawên teresan gihan gund, gund! Her kes têkevin hindurê xwe, zarokan ji destê xwe bernedin, eman ji desthilanîn nekevin, haaa!» qêriya û bi hewşê de bazda.
Lê cîb berî wî gihabû ber derî. Eskeran navtar û derûdora gund bi carekê ve zeft kiribûn û xwe dadabûn malan jî. Eskerên vê carê mîna ku neqandîbûn, hin ji wan ji tîman jî girstir bûn.

Circîs pêrgî yuzbaşî çû:
«Îcar vê carê tu ê çi qiyametê bi serê me de bînî, qomandar!»
Çend eskeran piştî ku ew mîna rêsiyekî di nav destê xwe de pêçan, li hewa gijgijandin û virikî avêtin erdê. Devê G3ên xwe xistin defa sêngê û serî û repikî di ser re sekinîn. Di wê navê re jî tîm kişiyabûn hindurê qesrê, piçûk-mezin her kes diavêtin derve û li hinduran benzîn û mazot direşandin. Tiştê ku Circîs hîç ne dixwest bibihîsta, bûbû. Û him jî li pêş çavên wî.
Qêriya:
«Qewad lawê qewadan, ma ne tu jî çêlîkê misilmana
135
yî! Me hemiyan bikuje û vê bênamûsiyê meke» got û xwe çeng kir eskeran.
Atîllayê ku mîna marmasî ji hev vediziliya û li dora xwe dizîvirî, demaçe tazî xistibû destê xwe û tîqtîqa kenê wî bû, bi her çend eskeran re xeyidî:
«Wî girêbidin û dev jê berdin!»
Bi kindirê ew girêdan. Mîna pilingê ku di xefkê de lêdan dixwar, bi serî de anîn. Bi kale kal diniriya û li ber xwe dida. Tîman jê hinekî bi wir de, serê Idrîs ji hev belav kiribûn. Nesîma ku keça Idrîs û bûka Ehmed bû, biribûn pişt dîwêr û li wir dest diavêtênê. Eskeran piçûk-mezin, nêr û mê hemû dabûn ser hev, bi pehîn û qûndaxan ketibûn nav wan û kincên li ser wan diçirandin. Li ber xwe didan. Bi derbên wan hema hema xwîn ji serê her kesî dihat. Dev û diranên her kesî pelixîbûn. Lêvên her kesî

çiriyabûn. Mirov digot qey xwe bi asîtê şûştibûn, rivîn ji
canê hemiyan diçû. Pîrekan tep li sênga xwe û zilaman jî
kulm li serê xwe dixistin. Zarokan mîna çûkên ser hêlînê
serî û gewde kiribûn yek, destên xwe dabûn ber çavên
xwe û îske îsk, kaze kaz û nûze nûza wan bû. Her kes digiriya,
her kesî dikir hewar hewar, zimanê her kesî ji tîhna
kişiyabû. Zilaman bi nav şeqên xwe girtibûn û pîrekan jî
zarok kiribûn stara paş û pêşê xwe. Lê Circîs jî dîsa bûbû
agirê semewatan û bêwestan nav di wan dida:
«Waaa keça Sarêêê! Sara piçûkkk! Lê lê Durêêê, dengê
te nayê min, lêêê! Keçê nav di wan bide!...» Eskeran Durê
li nav gund di xirbeyekî de girêdabûn, têra xwe lê xistibûn
û ew bi tena serê wê hiştibûn. «Li ber xwe bidin. Ji desthilanînketin
bênamûsî ye. Di liberxwedanê de çi bikin ji
mirov ne eyb e. Ew dihetikin. Ew bêşeref dibin, ew ji dînê
136
xwe derdikevin, ew binketî mirov serketî dibe!...»
Di vê gavê de li her çend malên ku girêdayî wî bûn jî
eynî tişt diqewimî.
Circîsê ku bi gezan êrîşî canê xwe dikir, çend gotinên
ku bi tirkî dizanîbûn jî ji bîra kiribûn û bi kurdî dida nav:
«Kafir ji we bi namûstir û bi şereftir in. Firewn jî bi
qasî we teresbav ne bûye! Lawên qewadan, lawên qûndekan,
ez beraz im, beraz! Berê xwe bidin min berazî!...»
Çavên yuzbaşî li hev qulipîn û mîna mêr ber pê de herikî.
Bi germî xwîna wan vedixwar, têhna wî ne dişikest.
Her ku li wan dixist bêhtir lê sor dibû. Piştî ku bi hêrs
pehînek li termazê û yek jî li tengala wî xist, pê li sêngê

kir, demaça xwe xist hindurê devê wî û mîna Haydar yuzbaşiyê ku bi Heso re peyivîbû got:
«Kîrê min, yanî tu di quzê min e jî ez ê te nekujim!
Mirin xelasî ye; ma ez qebûl dikim ku tu bimirî. Hîn pir maye. Em ê tiştên wilo ecêb bi serê we de bînin ku heta dinya hebe tirsa me ji dilê we dernekeve! Hûn ê di qu...ê dêya xwe nin û serê xwe li ber dewletê rakin, ha! Tu ê bibînî, hema ji niha û çend saleke din bê hûn ê çawa ji ber kurd mirditiya xwe fedî bikin û kîrê min di jina xwe ...in!»
Dengê wî diçû Circîs. Lê ji qehra nava xwe tiştek jê fêhm ne dikir. Devê xwe li lûla demaça wî şidandibû û her çend dirankên xwe ên mayî jî herifandibûn. Serê wî bi carekê ve di xwînê de mabû. Ji gayekî di bin kêrê de bêhtir li ber xwe dida.
Atîlla piştî ku bi wahc devê demaçeya xwe di şikeftika qirikê de li hev bada, wilo jî kişand û bêhnekê li qîje wîja ku li tara jorê dihat guhdarî kir. Dû re jî xwe li wir girt û bêhnçikyayî ber bi wir de bazda.
137
Li tara jorê tiştên ku di Fermana Filehan de bûbûn, dihatin kirin. Tîman xwe li bûka Bedrên radikişandin û derpî jê dişemirandin. Bedranê ku ji serî de dizanîbû wê mesele wilo tevbigeriya jî, bi kêra ku li ser taziyê xwe girêdabû, xwe di tîman werkir û roviyên du heban ji wan berdan erdê. Lê tîman jî hema di cih de piştî ku ew û bûka wî bi guleyên reşaşan kirin serad, temamê kufletê wî jî xistin hindurê ferd û çewalên genim, devê ferd û çewalan girêdan û agir berdan hemiyan. Ji vê malê lawikekî şeşheft

salî, keçek û du xort sax filitîbûn. Lawik bi hatina
terempêlan re bazdabû kadînê û xwe di nav kayê de veşartibû.
Keçik li Nisêbînê bi mêr bû û ji herdu xortan jî yekî
li Manîsayê eskerî dikir û yek jî salek berê xwe gihandibûn
çekdaran. Tîman neh kes şewitandin. Ji van ên şewitî
pênc jê zarok bûn.
Helîkopterên ku karê xwe qedandibûn, piştî tibabekî di
ser gund re nizim gêr bûbûn, çend sarox avêtibûn jêr û jora
gund û çûbûn, dîsa vegeriyan. Cendekê herdu tîman di nav
xwe re hilanîn û bi hêrs berê xwe dan hêla Mêrdînê.
Zorava dişewitî û qorzîbirên xaniyan bi fitîlên deremêtan
re bi hewayê de difiriyan. Agir li hinduran, axur û
kadînan dilîst. Neviyê Bedrên di nav dixana kayê de nîvfetisî
xwe avêt derve û li kulmoza esker û tîman rast hat.
Lawik dan ber qezetoreyan û dû re jî kelaxkê wî avêtin
nav êgir. Heta berî niha bi seetekê jî ev Zorava bi zarokan
pir şêrîn û xweş bû. Vî lawikî li hinduran çirtvîtk avêtibûn.
Bi hevalên xwe re sê-çar caran navtarên gund li hev xistibûn,
dabûn dû mirîşkan û xwe di nav zibil de hiştibûn. Li
zirnazîqê siwar hatibûn. Di nav terabêlkê de sûretê teyrikan,
pez û dewaran çêkiribûn. Dêya wî a ku li hewşê tîm
138
ketibûn ser zikê wê, nîvişkê çêlekê li ser nanê wî kiribû.
Nanê xwe xwaribû û bi kalikê xwe re bi kaban û xarên
zindoqî lîstibû. Li dor seetekê razabû jî. Xewnên xweş
dîtibûn û bi ken ji xewê rabûbû. Bavê wî navê Xeyrî lê
kiribû. Pîrika wî navê ê din jî kiribû Serdar. Kalik jî navê
ê sisêyan kiribû Reşo. Lê niha yek ji wan jî tune bû. Zorava

bi rivînên hinavan, şewatê û tîrêjên rokê weke hêtûnê sincirîbû. Bêhna goştê insanan mîna merşekî xwe dabû ser gund û ne diqeliqî. Ji bilî ku ji her derê gund dengê qîr, hewar û nalînan bi dixanê re dirêjî ezmên dibû, ji tu dereke din deng ne dihat.
«Terorîstino, dengê min tê we!» Atîllayê komutan got. Circîsê ku wek hejikekî li erdê vepelixîbû, li qûn rûnişt û bi haweyê ku wî ew binpê kiriyê peyivî:
«Qomandarê bêxîret, te zorya me bir, lê te qezenc ne kir lawê kûçik. Em kurmanc ji cinsê masî ne. Ma masî diqedin? We bi masîkên çemên welêt re şer kir û we ew xwarin. Lêbelê ew gamasiyên ku di binê behra vî welatî de raketîne, ê ne wê we dabelihînin. Ê ne hûn ê ji destê...»
Bi teqandina deremêtên ku xaniyên wî dianîn xwarê re qêriya:
«Ha ha ha! namûsiz ewladî, Qibrîstir, yûnan kafirîdir! Qorêdir Qorê!...»
Ehmedê ku dêya wî bavfileh bû, dê yazdeh-duwazdeh salî bû û bavê wî ew ji nav agirê fermanê revandibû, ji komutên re got:
«Qomandar, heger Xwedê hebe û bi rastî jî li ser heqiyê be, ew Xwedê wê ahê me û vî miletê belengaz ji we re nehêle û welatê we xerq bike. Lê heger wek ku telebeyan digot, Xwedê tune be, wî çaxî jî her tişt li ser namûsa kur-
139
mancan dimîne. Ez kurmancan baş baş nas dikim. Ew heyfa xwe di hûrê gur de jî nahêlin. Ez bawer nakim ku ew ê vê zilma kesnedîtî ji we re bihêlin!...»

Mela Xelîl mîna dermala di bin kêrê de, li jêra Circîs girêdayîbû û di ber xwe de ha ha diniqirand. Di dawiyê de wî jî a xwe got:
«Lo lo Circîsooo! Ma min ji te re ne gotibû ku di ayeta el fasiqiyûnî de esker fasiq û zinêkar in. Xwedê gotiye gava ku hûn kurmanc nebin yek, wê esker li ser bênderên we him bazdin ser jinên we û him jî wê xwe bi xwe we berdin ser jinên hev. Lê te bi a min ne kir û te her tim erza min şikenand. De îcar bixwe ha!»
Circîsê ku ziwa bûbû, heta jê hat dengê xwe bilind kir:
«Mela xurifiyê destê zilma tirkooo! Hey topek ji eva niha mezintir li malê ketooo! Ma me kîrê te û wan û van eskeran ne ...ir dêya xwe, ma em ne bûn yek û me neda dû wan? Welatekî da dû wan, welatekî! Ma kî ma ku neda dû wan! Heta bi teyrik û tilûrên vî welatî jî dan dû wan. Welatekî jinên xwe, keçên xwe, lawên xwe bi tiving kir û bi çiyan xist! Welatekî mal û canê xwe teslîmî wan kir! Welatek li piştê xistin! Me ew di nav livînên xwe de vedişartin, me ji devê xwe dikir û di devê wan radikir, me li xwe ne dikir û li wan dikir, pê de rîn, pê de rîn!...»
Atîlla jî mîna singekî sekinîbû û bala xwe dabû ser gotinên wan. Lê piştî ku Mela Xelîl got, «Xwedê di ayeta el qahbiyûnî de gotiye esker qehb in», nehişî êrîşî ser kir û heta ku giha ser, wilo jî demaçe berdanê. Miheqeq dilê wî bi kuştina wî hênik ne bûbû ku kelaxê wî bi carekê ve mîna gokê da ber şeg û pegan û bi mirîtî ew li wê navê bir û anî. Dû re xwe dada Ehmed, li ber sekinî, demaçe xist

textikê eniya wî, «kurmanc heyfa xwe di hûrê gur de jî nahêlin, ha!» got û lingê wê kişand. Ehmed bi ser tengala xwe a rastê de komikî ket. Li gora wî êdî tiştekî ku bikira ne mabû. Li wê navê mîna beranê tof çû û hat û got:
«Ji niha û heta çar rojan hûn ê ji vî gundî bar bikin. Û ji Mereşê û wir de, hûn li kîjan bajarî bi cih bibin hûn serbest in.»
Dû re jî li pêpîka xwe xist. Temamê esker û tîman li dorê civiyan û bi pêpîka wî a duduyan re li terempêlan siwar hatin.
2
Bi çûna eskeran re zilam û pîrek ji hev veqitiyan û li hev temaşe kirin. Pîrekan ji zilaman, zilaman ji pîrekan fedî kir. Herdu hêlan jî serê xwe berdan ber xwe. Zilaman bi dizî hêsirên xwe paqij kirin û bêhemdî xwe di cih de rûniştin. Pîrekan jî bêdeng neperûşk ji ruyê xwe dan û xwe li hev rapêçan. Zarok ji berê bêhtir dilerizîn. Piştî qederekî bi wî haweyî, ji bilî Circîs û Perîxana ku nîvmirî li erdê rast bûbû, her kesî xwe da ser hev, ber bi malên pîberan de bêhnçikyayî bazdan û xwe dadan cîcerkên avê. Lê pîberan jî nemerdî ne kirin, ew jî bi satilên avê û kincan ve pêrgî wan hatin. Ew jî bi erdê ve çirisîbûn, ji girî ziwa bûbûn û beherîbûn. Wan jî axîn kiribû xwîn. Li ber xwe ketibûn. Xwe ne tiştek dîtibûn û bi ser Xwedê û pêxember de zûriyabûn. Lê Xwedê û pêxember bi hewara wan ve ne hatibû û dest û lingên esker û tîman ne şikenandibûn, çavên wan kwîr ne kiribûn. Mêr bi dîn û xwedayê xwe re ha ha kufirîbûn û wek zarokan giriyabûn. Pîrekan porê xwe kur kiri-

bûn. Keçan guliyên xwe jê kiribûn. Sêng û berên xwe terişandibûn. Rû bi neperûşkan anîbûn xwarê. Jinek bi kêrê kişiyabû keziyên xwe ên ku erd dimalajt û serê xwe di xwînê de kiribû kulîlk. Zarokên wan hîna jî mîna pelên çilo diricifîn. Kûçik ne direyan. Kevokan xuyanî ne dikirin. Ezman ji teyrik û tilûran xalî bû. Beytikên ku bê hêlîn mabûn, xwe ji gund dabûn alî û bi qelêç de terqiyabûn. Di heyamên berê de li hin gundên Torê, gava ku berazan car carê bi êvarkî re xwe diavêtin hinduran û gundî li wan derdiketin, berazan jî hindur xirîxopan dikirin û tiştekî ku wê bi kêrî tiştekî bihata li ser lingan ne dihiştin. Lê esker û tîman ji berazan jî xerabtir bi serê Zorava de anîbûn! Her tişt di xwînê de belav kiribûn û dû re jî agir berdabûn her tiştî. Zorava mîna pûş û pelaxê dişewitî. Kalîn û nalîn ji her malê bilind dibû!

Circîsê ku di kurmanciya kevin de, ê roja qal û qewamê bû, weke şikêreke kufarî di mextela xwe de rûniştibû û ziq li xaniyê Heso temaşe dikir. Felek lê geriyabû. Xem û xeyalan dilê wî bi nav herxên tarîxê de revandibûn û dabûn ber bayê zemanan. Dengê Sarê û Heso, Kenêr, Mela Salar û Erol Efendî mîna dengê çûkên di banga sibehê de, di guhên wî de vedida. Vî mirovî di vê bêhnikê de ewqas zilma berî niha ji bîra kiribû û xwe bi qasî teyrikên ser hêlînê bi hizûr didît. Termê Mela Xelîl, Ehmed û çend kesên din hîn ji erdê ranebûbûn, lê wî yek ji wan jî ne didît. Idrîs nixuriyê wî, bavê Serdêr û malxwêyê malê bû. Li ber dilê wî pir şêrîn bû. Cendekê vî xweş mêrî mişarekê

jê bi wir de bû. Ne didît. Tiştê ku bi Nesîmayê de
anîbûn ji bîr kiribû. Dengê qîje wîj, hewar hewar û nalîna
birîndaran ne dihat guhên wî. Keleha wî bi bombe û dere-
142
mêtan li erdê sekinîbû û bi stûnên tarîxa bav û kalên wî re
neqş û rengên kultura wî şewitîbû. Ev ne xewn bû. Lê wî
li van hemiyan wek xewnekê jî ne dinerî.
Bi rakirina terman re piştî ku Hesûk satilek av bi ser
dakir, mîna hêsîrên zindana Diyarbekirê ku bi darê eskeran
ji xewê şiyar dibûn, çengî wê navê bû û wek dînan bi
vir de û wir de beziya. Dû re jî bêhnekê sekinî; li derdora
xwe temaşe kir. «Haho, haho!» got û wek pisîkekî ji cihê
xwe qevizî. Berê xwe da jora gund û beziya. Lê a wî ji
bezê bêhtir lewlikandinbû. Mişarekê ne çû ket û dîsa rabû.
Mîna kevjalan bi rê ve diçû. Dilê kafiran jî bi halê wî dişewitî.
Cidhên da dû. Li ser bênderên ku eskeran serê Keyo
firandibûn, li pêşiya wî zîvirî û bê gotin galonê avê xist
devê wî. Circîs vexwar û vexwar heta ku li ser piştê ket û
li erdê pahn bû. Hişê wî niha tam hatibû serê wî û kul û
birînên wî dîsa tev rabûbûn. Piştî çend kêlîkan, bi haweyê
ku ji reha qolincê birîndar bûbû, axîneke bi dilşewatî
kişand. Hinavên wî mîna bixûrê dişewitîn. Dû re jî bi
wahc da xwe û vê carê jî berê xwe da şikefta ku çekdaran
wek girtîgehê bi kar anîbûn. Neqeba wî û şikeftê sedek erd
tune bû. Bi lez xwe berda hindurê wê û di bin qesela gêris
de ax vepexirand. Demaçeya xwe û xincera xwe a şingalî
dît. Demaçeya wî belçîkiyeke çardeh derbî bû. Qewlikê
wê jî mîna qayişa piştê, sixtyanî bû. Bi sê cercûran û hersê

cercûr jî dagirtîbûn. Circîs piştî ku bi kelgermî qayişa demaçeyê li pişta xwe şidand, wilo jî ji şikeftê derket. Li ser pêyan hinekî sekinî û li binya qesra xwe nerî. Termê kuştiyan wek bereteyên li ser berfê jê xuyanî kirin. Piştî ku li sênga xwe xist û bi gezan çû dest û zendên xwe, berê xwe da jor û rêya qelêç girt. Cidhên da dû. Wî guh nedayê.
143
Di dawiyê de Cidhan li binya rez gihayê û ji pare bi zendê wî girt:
«Yabo wê te bikujin, vegere!...»
Durê jî hat û xwe gihand wan. Piştî ku çavên wê bi xincer û demaçeya Circîs ket, rûnişt; bi tepan li kabên xwe xist, çavên xwe girt û devê xwe vekir:
«Wey li min pepûka serê çiyan, mêr di me de ne man, ne man! Kalo bû, Kalo jî ji desthilanîn ket. Ma ku ev sîleh hîn bi kêrî rojek wilo neyên, ji bo çi li ba me bûn, looo! Kûçikbavên eskeran, darî çavên te dest dirêjî namûsa te dikin û tu fîşekekê bernadî wan, ha!...»
Circîs wek simaqê lê nerî û wilo jî peyivî:
«Keçê Pîrêêê, te ez teqandim, bes e! Ez girêdayîbûm, teresan ez girêdabûm. Ma çawa ez ne ew beraz im!...»
Pîrê piştî ku jê bawer kir, vê carê jî êrîşa xwe bir Cidhên:
«Bênamûso dev jê berde, bila here û bigire ser qereqola Stilîlê. Kuro bihêle belkî çend qûncilikan bikuje, da ruyê me sipî bibe!...»
Qelaçan Circîs mîna miqnatîsê ber bi xwe de dikişandin. Tu kesî wê nikarîba ew qanih bikira û ew ji rêya wî dageranda.

Cidhan heliqand:
«Zû ji ber çavên min bikeve!» got û lezand.
Cidhan ji ser venekişiya. Mîna çûkekî rahiştê û berê
xwe da gund:
«Yabo, tu ji me re hîn pir lazim î!»
Piştî ku Durê çend kevir di termaza Cidhên de vekirin
û Circîs jî bi gezan çû dev û ruyê wî û got «kûçik lawê
kûçik, min berde!» berda û nema têkilî wî bû.
144
Sirt û sirt çû. Şopa ku dabû ser qedexe bû. Gundî heta
bi bena rez û Pîr Kemêl dikarîbûn biçûna. Di vê dema ku
ji wî pê ve li qelêç tu insan tune bûn, eskeran ew bidîtana
av lê venedixwarin. Xema wî esker bûn. Dizanîbû bê bi çi
rabûbû û çi dikir. Biryara wî biryar bû. Qîma xwe bi her
cureyê zilma wan anîbû, ew bêminet kiribûn û ji ser a xwe
ne hatibû xwarê. Pir êşiyabû, pir diêşiya û wê hîn bêhtir
biêşiya. Lê bi cobarê ku êş û merez diherikand dilê wî re,
cobarekî ku camêrî û liberxwedana mêrên berê diherikand
jî hebû. Mêrxasiya bav û kalên wî û soza mêrên çê, di
mejiyê wî de raser derketibû û bi xwîna wî re keliyabû.
Bêyî ku bi hêl û mêl bizanîbûya azadî çî ye, bedêla wê
çendî giran e, bi êrîşa eskeran re ji alimekî bêhtir, bi qasî
mezinahiya dinyaya xwe azadîxwaz bûbû û di nav êgir de
xwe li azadiyê rapêçabû. Digel ku destavêtibûn jinên malbata
wî, law, birazî û pismamên wî kuştibûn û zarokên
wan şewitandibûn, wek deqekî li ser lingan sekinîbû;
temamê kayinatê di qelaçên Zorava de dabû ber xwe û pê
re şer dikir. Diqêriya û digot:

«Bindestî ne eyb e, lê gava mirov li ber xwe nede eyb
e. Serîhildan qedandina nîvê şer e. Me kurmancan her tim
serê xwe hildaye û bi romîkan re şerê xwe heta bi nêvî
biriye. Em bindestê wan in, lê me tu carî jî bindestî qebûl
ne kiriye. Waweyzê! Reyiskê devgenî ku dibêje hûn kurmanc
ne tiştek bûn û min hûn kirin tiştek! Ez beraz im,
beraz, de ji min re derkevin meydanê, hêêê!...»
Qelaçên gundên bûblaniyan, mîna çiyayên Omeriya
stewr mabûn. Pûş û pelaxê avêtibû qamê, zîhayên maran
di nav de dilîstin û Circîs jî dabû navê. Stiriyên kelbeşê,
şahfel û xernûfê mîna bizmaran di canê wî de diçûn xwarê
145
û li êşa xwe hayî ne dibû. Di nav bahoza zilmê de li starekê
digeriya. Lê bahozê jî ne bi tenê star, heta bi hêviyên
wî jî ji hev belawela kiribûn. Mîna şêrekî birîndar dev li
xwe dikir û bi xiram, taht û latan de hildiperikî. Diket û
digindirî. Radibû û dîsa diket. Kîna ku di dilê wî de gihabû
hev, sebra wî bi carekê ve têk biribû. Rûniştin û bêhnvedan
ji bîra kiribû û mîna kulbeşkê di ser hev re diqulipî
û diçû. Di mehsera diyarê Sadan de li cihê ku Serdêr
helîkopter ji ser Reşo ber bi xwe de dagerandibûn sekinî,
qutikê xwe di ser xwe re anî, qutik hemû bi dest ve ne hat,
bi gezan çirand û mîna ku Serdar didît, jê re li ba kir û
qêriya:
«Eferim beranê mino! A din jî, a din jî werîne xwarê!
De wilo nereve lawê tirê, ha ha reviya, reviya! Kuro Serdaro
berdê, binere bê tu wê jî naxînî!...»
Di vê navê re marekî reş î mîna mircaqeqî dirêj û

ewqasî jî qalind ji pêşiya wî fîkand û bi lez di ber re bihurî.
Circîs ji nişkê ve xwe da ser hev û bêyî ku lê bide
demaçê yan jî rahije kevirekî filan, bi hêrs xwe têwerkir.
Lê mêr jê daxwar. Heger xwe bikira wek wî, av ne digiha
ser. Ji hindam de rabû û da dû marê ku tibabekî jê dûr sekinîbû,
serê xwe rakiribû û ziq lê dinerî.
«Ê ne ez ê di ferşikê bin serê bavê te, de were wer!» got
û vê carê jî bi keviran rikêbî ser kir. Lê mar jî ne mar bû,
mîna insên bû. Mirov digot qey dilê Circîs li ber vebûbû û
temamê kul û êş û merezên wî jê xuyanî dikirin. Rabûbû
ser teriya xwe û bi haweyê ku dixwest tiştek jê re bigota,
xwe bi carekê ve dihejand; zimanê xwe bihustekê derxistibû
û bêwestan li dora devê xwe dibir û dianî. Lê Circîs
fêhm ne dikir, xwe dizirzitand û ber pê de diqedimî. Di
146
dawiyê de kire kufe kuf, bi dengekî bilind kwîtand û
fîkand, xwe li hewa zîz kir û mîna tîra ku ji nav lêvên
kevên bireve, bi newalê de firiya.
«Ha wilo, de here ha! Desthilanîn fereca xêrê ye», ji
xwe re got.
Dû re jî, «ma ew ins bû, ew cins bû, ew çi bû gelo?» ji
xwe pirsî û bêhnçikyayî berê xwe da bin berqefa ku Reşoyê
Sarê û Menca Xerzî li wir ketibûn qirika hev. Niha bi
tenê bû û tenêbûyinê jî him gelek tişt dianîn bîra mirov û
him jî mirov bi gelek tiştan dihisand. Mejî qar dibû, guh
miç dibûn û heta bi pêjina kêzikan jî dihat mirov.
«Lawo Reşoyê Circîsss!» Wî pir dixwest ku bi vî navî
bangî Reşo bûba.

«Serdaro pişta te zeft kiriye, teyr nikarin di ser te re bifirin. Pêşiyê li kolordiya Diyarbekirê bigire; xwe biavêjin qelaçên pêşber, ha bavê mino, ha, ha!» got û bi wir de qevizî.

Lê çawa qevizî wilo jî çik sekinî û piştî bêhnikekê dîsa li cihê xwe vegeriya. Bêkip li ser axê rûnişt; bi tilîkan ax kola, bêhn kir û di ruyê xwe da. Dû re jî keserek kişand û pala xwe da tahta di qorziya berqefê de. Berqef hênik bû. Hênkayê xwe bi nav laşê wî de berda û damarên wî sist kirin. Bi qasî ku sist bû, pê re jî ewqsî fikirî. Gelek tişt pev re hatin bîra wî, gotinan zor dan hev û bêwestan di qahfûrê serî de zîvirîn. Xwe ne girt, devê xwe xist erdê, bi tepan bi nav serê xwe ket û dîsa qêriya:

«Wax li minêêê! Keça min ê Mencê, Reşokê te jî kuştin! Reşoyê Mencê, Mencê!...»

Menca ku li ser rojan bû û hêsîr ketibû destê çekdaran, li hindama Şahbanê ber avêtibû. Çekdaran zarok li wê

147

navê hiştibûn û berê xwe dabûn binya xetê. Lawik miribû. Circîs piştî ku sifetên temamê kurmanciya xwe li Mencê kirin û ew kir taca serê xwe, mîna berê pala xwe da tahtê û hizirî:

Ez ji hemû hêlan de giham dawiya xwe. Emir çû. Lê ma bi tenê emir, pê re mal û milk û urf û adetên bav û kalan, şeref û namûs jî çû. Ka ew barbihêriya berê, qedandinî, mêrxasî û camêrî! Romiyan her tiştê me talan kirin û ê mayî jî kirin sergo û dev jê berdan. Jin mabû, li pêş çavên me ketin ser dilê wê jî. Mêr di me de neman, mêr!

Mêrekî bi du qurûşan di nav me de ne hiştin. Erê, emir çû.
Min tiştek bi ser tiştekî ne xist û min her tişt winda kir.
Emirê leglegê çû bi teqteqê û ê min jî çû bi hilperkê, kuro!
Hilperkeke pûç û vala. Hoooweh, howeh! Di berberiya
qulipandina ser sînoran, piste pista ber dîwaran û çavnebariya
milk û mêl de min xwe pîr û kal kir, haho!
Keniya û peyivî. Kenê wî liblibî bû. Dengê camcamkan
dida.
«Wek Cidhankê min li serê me hatibû: Qewlikê tije
taxên pereyan winda kiribû û li mûçinkê digeriya, kuro!
Romiyan welatê me zeft kiribûn û me jî li ser sînoran gule
di hev re difirandin. Tew, tew, Fatê were dawetê. Hema
bila Heso mezinê gund û ez jî şêwirdarê wî bama. Hema
çawa ba, wî mezinî wê dest neavêta keç û jinên me; agir
bi xaniyên me nexista û temamê çandinîka me neşewitanda.
Me li ser keç û xortên ku hevdu direvandin mêr ji hev
dikuştin. Îcar keçan li wê navê bihêlin, li ser bênderan bi
jinên me re dihemilin. Qurana me dişewitînin, bi xweda û
pêxemberê me re dikufirin. Me li çarsingê dixînin û di
devê me de dimîzin. Hinavên zarokên di dergûşê de dite-
148
rişînin û bi saxî wan dişewitînin. Çavên pîran dipelqijînin.
Mêran ser jê dikin. Tirk wehş in, wehş! Xwedê, Xwedê!
Ew xwedayê xefûr û kerîm çawa ku ziman xistiye devê
temamê insanan, em kurmanc jî ebdên xwe dîtine û zimanek
xistiye devê me jî, lo! Lê tirk qebûl nakin, kuro!! De
ji xwe re li vê ecêbê binerin! Em ê bîst-sîh milyon kurmanc
di welatkê xwe de bijîn û em ê hema nikaribin bi

zimankê xwe bipeyivin! Tirk ne mezin e, mexlûqekî piçûk
û bêmirês e. Insanên mezin ji xwe fedî dikin. Dewleta wan
jî ne tu gû ye, karê qelsan dike. Qels tirsonek in û mîna
wan di mirov de dikin. Hema gundiyê herî pîs jî mezinê
me ba, wê tu carî kafirbaviyeke wek a wan di me de ne
kiriba. Hey gidî Heso hey! Zorava têra vê birekê hemî
dikir, looo! Lê ji ber wê fitne û fesadiya me, em car carê
li girara rijî û nanê tisî dihesilîn, birakooo. Di wan çend
salkên ku me dev ji berberiyê berdabû û me xwe li tifaqê
girêdabû, em hemû jî dewlemend bûbûn, dewlemend! Bê
çi xweş bûn ew sal. Tifaqê em qenc û merd kiribûn. Qencî
û merdî camêrî ye. Tiştek ji camêriyê mezintir tune. Mirov
li ba ebdan pê serbilind û li ba Xwedê jî xêrdar dibe.»
Bû îske îska wî û giriya:
«Lê niha Heso, Sarê, Kenêr, Salar, Erol, ma hûn dizanin
bê ez çawa bûme pepûk û bi çol û çiyan ketime? Erê,
erê, we xwe ji mengenê xelas kir û we ez tê de hiştim», got
û bi çarlepikan ji bin berqefê derket.
Mîna ku wî jî digot, bi rastî mirov digot qey Xwedê ew
ji bo ibretan li dinyayê hiştibû. Ji zû de heştê derbas kiribû
û nedimir.
Çeng bû û nehişî li ezmên nerî. Ew tiştên berî niha
hemû ji bîr kirin, destê xwe ji helîkoptera ku ber bi Ome-
149
riya de diçû hejand û dîsa da nav:
«Were, de were teres, va ye ez li vir im! Ez bavê xezebê
me, ez kurmancê kevin im, ez kilê çavên Perîxanê me,
ez nihîtê neqaba me, ez ew ê rojên şerê giran im! Ê ne ez

ê di ferşikê bin serê bavê tirkê pêşî...» Piştî ku di vê dawiyê de çend carekî çûbû Diyarbekirê û li kolordiya wê nerîbû, ji eskeran bêhtir xeber ji temamê tirkan re dida.
«Were min lawê tirê, de were ha!...»
Destê xwe li sênga xwe dixist û kevir bi ezmên de şeg û peg dikirin. Kevirên wî jî hemû li ber diketin. Yek jê hindik mabû li qotê serî keta. Heger helîkopter ji van ên skoskî bûya, wê lê bireşanda. Helîkopter a keşfê bû û ji sedî sed li çend çekdarên ku li himbrî biryarên Reyis derketibûn, ji refê xwe veqetiyabûn û di çiyayên Omeriya de xwe vedişartin, digeriya. Helîkopter bi dîtina reşê wî re hîn bêhtir bilind bû û xurt çû. Lê wî kevir ji destên xwe bernedan û heta ku helîkopter ji ber çavên wî ket jî, habela kevirên xwe têwerkirin. Tam di vê bêhnikê de çavên wî li demaçeya wî a ku li ser zikê wî edilîbû ket, «wey qede bi min keve!» got û bi wahc demaçe ji qewlik kişand. Piştî ku cercûrê xwe vala kir, vê carê jî got «de here ha, min bi wî jî ve! Segbav!...»
Di wê kelecanê de berê xwe da newalê û meşiya. Şerwalê wî ê gewr lê bûbû bele. Ji xwe ji taqet ketibû, îcar şerwalê botanî ew hîn bêhtir ji taqet dixist. Çi dirî, qurinc û stiriyên ku hebûn xwe li navrana wî digirtin. Şerwal ji stiriyên ku di çîm, rihn û kulîmekên wî de çûbûn xwarê, bi carekê ve di xwînê de mabû. Lingên wî jî. Stiriyan gizlewêt kiribûn serad. Wek gurê ku xefk bi xwe re dibir, gewde bi dû de dikişiya û diçû. Ji xwêhdanê bêhtir xwîn ji
150
dev û ruyê wî diherikî û hema pê re jî hişk dibû. Pê nizanîbû

ku qutik avêtiye û tena fanêrekê sertazî maye. Pirça gewr û boz di xwînê de bûbûn bisk û bi ser berstikê ve paldabûn. Sertazî bû. Porê serî mîna pîjdankan rabûbû. Simbêlên wî ên ku li ên êzîdiyan çûbûn, mîna du xincerên şingalî bi ser defa sênga wî a beranî de kişiyabûn. Ruyê wî westyayî bû, lê kîn jê dibariya. Çavên wî mîna curnê birxulan, kûr çûbûn. Lê hîn jî zindî xuyanî dikirin. Şer û pevçûn û liberxwedan ji her derê vî pîremêrê ku felek li serê wî geriyabû difûriya.

Besta newalê derbas kir, giha ser rêya Stilîlê û bêyî ku xwe bide ber taldeyekê, mîna çitekî di nîvê rê de sekinî û herimî. Circîs ketibû diruvekî ku çawa difikirî, wilo jî li ber çavên wî bi ruh dibû. Ev yeka han jî dibû sebebê ku çawa bidîta wilo jî tevbigeriya. Cihê ku lê sekinîbû ji xeta mayinan jî talûketir bû. Terempêlên eskerî her bêhnik dikarîbûn derbas bûbûna. Ferqa vir û çiyê ji hev tune bû. Mirov ne digirtin; ji dûr ve li mirov girêdidan û bi mirîtî dihatin ser mirov.

«Erê hefadê mino, nihîtê neqeban», ji Reşoyê Sarê re digot, «aha te dabû vir, tu ketibû pêşiya peyayên xwe û mîna pilingekî tu bi wî xiramî ve hilperikîbû. Eferim, mêr divê wek te bin», got û mîna Reşo da xwe.

Da xwe, lê yextyariyê rê nedayê; ew hişk zeft kir û kilkiland. Di ser hev re qulipî. Circîs ketin danediqurtand. Ji bo xwe wek kêmaniyekê didît. Di cih de rabû ser xwe û vê carê jî bi haweyê ku dabû ser patîka mayinan, pê bi pê çû. Lê çiqasî çû rê jî lê bû kaş û devê wî bi destên wî re giha pûş û pelaxê. Ku bi xwe bizanibûya li ser lapûşkan diçû,

kengî qîma xwe dianî. Di vê rewşê de xwe gihand latê ku
151
bûbû stara Reşo û Mencê û di tengala vî latî de, Reşo qira
eskeran anîbû. Ji lêt û ber bi çepê de qederê sedeke erd,
hewdê Kufarî hebû. Di eslê xwe de hewd ne kufarî bû;
xwedî cihan ji nivîsa wê a latînî fêhm ne kiribûn û wilo
nav lê danîbûn. Cihûyê ku sê sed û şêst û du sal berê hewd
kolabû, bi hosteyiyeke delal di jora hewd de li dora pêncşeş
rêzan agahiyek jî nivîsandibû. Ew nivîs heta salên
hezar û neh sed û şêstî jî xerab ne bûbû. Û heta heger sofiyên
Xerêb bi sebeba ku «nivîs kafirî ye, avê diherimîne»,
nivîsa niqirî xerab ne kiribana, bi wî haweyî ew nivîs belkî
çar sed-pênc sed salekî din jî bimaya.
Circîsê tîhnoyê zimankişyayî bêmefer bi ser hewd de
beziya. Hewd sergirtî, bejnekê kûr û ewqasî jî fireh bû. Wî
stuyê xwe dirêjî hindurê wî kir. Lê çawa stû dirêj kir wilo
jî kişand. «Ê ne ez ê di...» got û xwe dada keviran.
Marekî teyar bi nêçîra xwe ve di hewd werbûbû û di
nav bihusta ava ku di binê hewd de mabû ha ha dizîvirî.
Circîs xwe zewirand û lê da kevir. Lê hema pê re jî çavê
wî li çemçika ku bi dîwarê hewd ve daliqyayî bû ket. Bi
haweyê ku hin bi guhên wî bigirin, kevir di ber xwe re berdan,
guhên xwe firkandin û dest dirêjî çemçikê kir. Vê
carê bi aqilî fikirî: Fanêrê xwe li himberî zîroyan, perîkên
têtiyê nêçîra mêr û qirş û qalê, wek parzûn bi kar anî û
vexwar. Piştî vexwarina sê çemçikên avê, mar di wî halî
de hişt û dîsa berê xwe da latê stara Reşo.
Circîs navê vî latî kiribû «Latê Berên.» Her sal di roj û

seeta şerê guhera Mexelan de, beranek li ser vî latî digurand.
Lat bûbû wek ziyaretê. Heta ku qelaç û çiya li gundiyan
qedexe ne bûbû jî, ji gelek deveran keç û xortên bi
dil û bûk û zave dihatin tewafa lêt. Beran bi ser de ser jê
152
dikirin û govend digirtin.
Circîsê ku qul bi qul, kevir bi kevir her derê qelaçên
gundên bûblaniya nas dikir, wilo jî dewsa şerê ku Serdêr
û Reşo di van qelaçan de kiribû, yek bi yek ezber kiribû.
Çi kiribûn, çawa kiribûn bi hemî dizanîbû.
«Reşooo! Kuro rê bide kalikê xwe», got, çapilî ji dest
girt û li ber tîman veteqilî.
Çapiliya wî jî darikekî qeselê bû. Li sihûda wî, dîsa bi
demaçeya li ser xwe ne hisiyabû.
«Teq, teq, teq, teq...»
Di vê kêlîka ku Circîs şer sincirandibû û bi dehan esker
û tîm avêtibûn erdê, esker û tîman jî mîna xazik û zerzûlan
girtibûn cihê wî ê ku bi helîkopterê re şer kiribû. Neqeba
wî û wan bi beza xortekî çiyayî, deh-pazdeh deqîqe ne
digirt. Ji sirtên herdu qelaçan bi rehetî mirov dikarîbû bi
hev re bipeyivya. Lê qirdê wî hebû ku latê Berên di berpalê
de bû. Ji wan xuyanî ne dikir û dengê wî jî bi qasî dengê
mirovê ku di ber mirinê de wesyetê xwe dikir, nizim bûbû.
Heta vir jî baş bû, jê re li hevhatibû û baş meşiyabû.
Ev Circîs yekî wilo bû ku bi xwe tesîr li xwe dikir. Di
bin tesîra gotinên ku dikir û dan û stendina xwe de dima.
Li dor nîv seetekê agirê şer dadabû. Di şerê xwe de serketî
derketibû û miradê xwe li eskeran kiribû. Bi sedan esker

û tîm kuştibûn û bêhal ketibû. Êdî divabû hinekî bêhna xwe berda. Berda. Pişta xwe da lêt, berê wî ket Zorava. Lingên xwe radan, oda Heso dît û qesra xwe ne dît. Agir bi kezeba wî ket. Bêyî ku çavên xwe bikutkutîne li gund nerî û nerî û fikirî. Kuştina Idrîsê lawê wî hate bîrê. Di nava xwe de keliya. Ew û Idrîs bi hev re mezin bûbûn. Di navbera wan de pazdeh salek ferq hebû, ewqas. Ew stûna
153
hindur û Idrîsê wî jî desteka wê stûnê bû.
«Erêêê, ez îro baş pê dizanim ku Bişarê Çeto û Emînê Perîxanê ne xayin bûn. Wek min zor li wan hatibû. Romiyan mîna min tu rê ji wan re ne hiştibûn. Romî cenewar in! Ev ji kîjan tahtilerdê hatin û li me fesidîn? Rehên me birîn. Welatkê me kirin kaniya xwînê. Gelo ew jî insan in? Insan di insên de çawa dikere vê zilmê bike! Hema em neheq jî, na na em çima neheq in. Lê em neheq bin jî, dîsa nabe ku mirov ewqasî zalim bibe! Ma ne qaşo ew jî misilman in û ji ometa mihemed in. Mizgeft û minareyên wan hene, berê xwe didin qiblê, limêj dikin û rojî digirin. Îcar niha em û wan em ê bi hev re herin bihuştê jî, ha! Erê, erê. Ê hema bi telaq min nema berê xwe da qiblê û limêj kir. Bila cihê min dojeh be û çavên min li wan nekeve. Ew gur û em mîh in. Gur û mîh tu carî nikarin bi hev re bijîn; agir û barûd tu carî nikarin li hev bikin. Ew agir û em jî barûd in. Na, em ne barûd in; em rebênkên Xwedê ne. Hooweh li vê ecêbê! Tew bi ser de jî ez ê ji Mereşê û wir de herim!»
Dû re jî ji xwe pirsî:

«Erê ev niha çima ji Mereşê û wir de?»
Tê negiha. Digel ku pir fikirî jî.
Dîsa li ber xwe da:
«Ma gelo ez bi wan re nerim û xwe li vir bidim kuştin
nabe?»
Bi xwe de xeyidî:
«Circîso, ma qey tu dixwazî kinêsa te jî vemirînin, ha?»
Bêhnekê sekinî. Pişt re jî keserek kişand û li ber dilê
xwe geriya:
154
«Ez û kufletkê xwe tenê mane. Û 'destê bi tenê' jî
'deng jê nayê.' Carinan divê mirov bikaribe hin tiştên tahl
û no di ber xelaskirina hin tiştên xweş û şêrîn de daqurtîne,
bavo! Ev ji mirov re nabe eyb, dibe camêrî. Ma çi
heqê min li zarokên min heye ku ez wan bi xwe re bidim
kuştin?»
Îbo Begê Parsînî hate bîra wî.
Xwe ji dil aciz kir:
«Ma kufletê min ji ê Îbo Begê çêtir e?» got û dîsa ponijî.
Fermana Filehan hat bîra wî. Torê cih û warê filehan bû
û herêmeke bi ser Omeriya ve bû. Di salên fermanê de
zarok bû, lê baş mezin bû.
Van romiyan tiştê ku bi serê filehan de kiribûn, îro jî bi
serê me de dikin. Mîna ku li Zorava û gelek gelek gundên
din kirin, fileh bi carekê ve li ser bênderên gundan dicivandin,
keç û jinên sipehî ji komê vediqetandin û pişt re jî
piçûk û mezin didan ber devê tiving û qezetoreyan û dişewitandin.
Ji wan re digotin 'kafir!' «Kafirên mezin ew bi

xwe ne», got û peyv ji peyvê pêxist:
«Ji me re jî ’terorîst’ dibêjin. Ma em terorîst in? Gava
ji wan re ’kafir’ negotana, ma wê çawa ew qir kiribana?
Fileh jîr bûn û bi tifaqî tevdigeriyan. Ji me qenctir bûn,
qenctir. Û insanên qenc jî divabû berî ên pîs bihatana
kuştin. Pêşî ew qenc kuştin û îro jî me pîsa dikujin. Henekên
xwe bi aqilê bav û kalên me kirin. Bi gotinên ’em
misilman-ew kafir in’, xapiyan, bêteref man û wan jî bi
rehetî fileh ji ber xwe kirin. Îro jî dor hatiye me.»
Piştî ku bêhnekê sekinî û bi haweyê ku her tiştî safî
bike, zor da mejiyê xwe û got:
155
«Tiştek heye ku her tim ji her kesî re lazim e. Ew tişt
xurtî ye. Û xurtî jî bi tifaqê ve girêdayî ye. Tifaq qelsan
xurt û xurtan jî xurttir dike. Heta ku em kurmanc jî nebin
xwediyê xwe û exlaqekî wilo, em ê tu carî nikaribin xwe
ji bin nîrê zilma romiyan xelas bikin.»
Gotina dawî li hesabê wî ne hat.
Tewirand:
«Tew, tew, tew! Ez di nav xweliyê de li gokên zêran
digerim; kurmanc, kurmanck», got û dîsa ponijî.
Bi qasî ku ponijî ewqasî jî têde çû xwarê. Di dawiyê de
pijiqî. Lê ne bi devjeng û pevçûnê, bi stranê. Dest bi stirana
xwe a her gavê kir û bi haweyekî din got:
«De lolo, de lolo, de lolo Şêxê mino de lolo.
Erê de lolo, de lolo, şereka li me û van teresbavên
romiyan, aha li van qelaçan qewimî. Şad û şûdê Şêx Mehmûd
kekê Şêx Circîs kalikê Serdêr û Reşo gelek hene. Erê

vî xweşmêrî, bi sê dengan gazî dikirî lolo Circîso malik wêrano, çavên min ji agirê top û metilyoz û xweşkêşan nema devê canbêzarê ditefsilîne. Wey liminê, haho, Şêxê min bi tenê maye!...
Erê bavê mino de lolo, birayê mino de lolo, Şêxê mino de lolo, hewara me kurmancan têk çûye, Reyis xayino looo!...»
Circîs bi vî haweyî stira û stira heta ku xiliya û bêhemdî xwe ket.
156
3
Li qelaçan nuh reş ketibû erdê, lê li çiyan her der tarî bûbû. Bayê êvarê ji ser serê çiyayên Omeriya pûş û pelax dabû ber xwe û di newalan de werdikir. Germa dinyayê şikestibû. Sirt û pahnav hênik bûbûn, lê binê newalan hîn jî germ bû. Nêrkewan xwendina xwe a dawî qedandibûn. Çûkan xwe dabûn ser hêlînê, teyr û tilûran lûs girtibûn. Li çend stêrên ku di nîvê ezmên de hûrik xuyanî dikirin, hêdî bi hêdî stêr zêde dibûn û ber bi hev de dikişiyan. Omeriya reşxeriqî bû. Ji wan çiyayên wê ên ku şîn û hizin dibariya, ne dengekî lolo û lêlê dihat û ne jî ji derekê çirûskek agir diçû. Hîn ji êvar de şev qar bûbû û gur û wawîk dizûriyan. Dengê kundan, di hindurê newalan de li hev vedida û di rûbarê çiyan de bilind dibû. Ew Omeriya şênî, tije gul û gulçîn, dar û devî, bax û werz û kanî, mîna dêwekî heftserî li erdê veziliyabû û ji her derê wê dengê teban dihat.
Xew li Circîsê ku mîna bereteyekî li ser piştê ji hev pijilî ketibû, bi qasî zilma ku dîtibû giran bûbû. Lê giran

bûbû, lê kipîniyek bê çi bû jî jê ne dihat. Ji dûr ve, ji saxan bêhtir dişibiya miriyan. Ji devê wî ê vekirî, ruyê wî ê vemirî û eniya wî a qemirî, xuya dikir ku di xew de jî şer û pevçûna xwe didomand. Lê dîsa ji hêz û qeweta xwe ketibû, bê hawar û halan mabû û teslîm hatibû girtin; asaq tê de dikirin û wî jî ha ha nav di xwe dida û digot:
«Ez bavê xezebê me, ez kilê çavên Perîxanê me, ez kalikê nihîtên neqaba me!...»
Simbêlên wî ên şingalî dev û ruyê wî nixumandibûn û mîna du qilûçên beranan xwe dabûn binê ezmên. Dest û zend û çepilên wî ne dilebitîn. Ling û çîm û rihnên wî jî.
157
Lê sênga wî bêwestan hildihat û dadihat. Serê bêvila wî mîna çimê zinêr, hema di ser simbêlan xuyanî dikir.
Bi dengê kundê ku xwe li ser hewd danîbû, mîna ku ji devê topê derkeve, ji xewê çeng bû û bi wê navê de firiya.
Bi haweyê ku qernek di ser xewa wî re derbas bûbû û ji her tiştî mabû, bêserî li derdora xwe zîvirî. Lê ev yeka han zêde dom ne kir. Piştî ku bi ser hişê xwe ve hat, çong berdan erdê û li ser tahtê rûnişt. Lê çawa rûnişt wilo jî rabû; da xirêm û di serê sirtê de sekinî. Li newalê nerî. Newal wek teniya binê beroşê bû. Lat, qûç û şikêrên pahnavan, di nav rewrewkên reşayê de mîna rim û şûr û mertalan xuyanî dikirin.
«Yarebî bêlome be! Mirov dibêje qey kirî çiya li hev kevin, her tiştî haziriya xwe û şer kiriye; her der bûye kemînek!»
Li ezmên nerî. Ezmanê ku tije stêr bûbûn, mîna qefesekê

jê xuyanî kir. Pê xweş hat:
«Sibhanela ji qudreta vî xwedayî re! Ev zir ezmanê di ser me re bê çawa bêstûn sekinandiye, kuro!»
Li jor tevger hebû, liberxwedan, şer û pevçûn, qîr û halan û hewar hebû. Stêr dixijiqîn. Ji hinekan çirûsk, ji hinekan rivîn diçû. Hinek pir vemirîbûn. Hinek wek ava kaniyan hêdî bi hêdî ber bi hev de diherikîn û hin jî ji hev direviyan. Ji van stêran zivêr bû:
«Kuro bi telaq ew jî kurmanc in, kurmanc!» got û berê xwe da çiyayê Kurê kozika Serdêr.
Heyvreş bû. Ji heyvê re hîn gelek mabû ku derketa.
Şevê mîna xuya gur xuyanî dikir. Reşayê çiya û newal kiribûn yek. Mirov rêya ber lingên xwe ne didît. Lê Circîsê gurê şevên kurmancî ew rê didît. Canê wî bi hewa
158
şevê û xewa ku kiribû re zindî bûbû. Mîna ku li ser asfincê dimeşiya, ewqasî sivik bûbû. Mirov digot qey ba di bin lingên wî de bû, wek mêr diherikî. Xwe gihand newalê. Jê û hema çend gavekî bi wir de rêya Stilîlê derbas dibû. Rê ferq kir û bêyî ku bi xwe bizanibe bê çi dike, heta ku besta bi rê ve xelas kir jî bi lewke lewkê çû. Lê vî Circîsê ku bi her haweyî xwe kevirekî kurmancî didît, piştî ku bi reva xwe hisiya û rev bi tirsa ji eskeran ve girêda, demaçeya xwe ji qewlik kişand û dîsa bû xwê û ket êgir:
«Ez ê şevên reş û tarî me!...» got û vê carê jî li cihê ku jê bazdabû vegeriya.
Bêdengiya ruh helbet ne di pîrbûnê de bû. Mîna nêrkewê ku di sariya sibehê de dixwend û xuyanî ne dikir, bi

hingamê hatê, di nav dahfikan re xwe dadayê, bi bayê
beza xwe re lê xist û çû. Heger fikirîba ku bi wê reva xwe,
karekî bav û kalan kiribû, dibû ku eva berî niha ne kiriba.
Li gora kultura bav û kalên wî, mêrxasan bi şevê, û heta bi
rojê jî, divabû tu carî ne dabana ser rêyan û ji rêyan bireviyana.
Û wî jî tam wilo kiribû. Da xwe ku bi rêya xwe de
here. Çend gavekî meşiya û sekinî. Piştî ku got «qede bi
pîrbûnê keve», rûnişt û bi Serdêr re peyivî:
«Berxê mino, rewa di kalikê te de ne maye. Ez ê vê
carê nikaribim xwe bigihînim te, xweliya binê tenûran bi
serê xwe dakim û derd û kulên xwe ji te re bibêjim. Reyisê
te ê heyamekê û qûncilikên romê, pişta vî kalikê te ê
cilezabî jî tewandin. Em hemû gihan dawiya xwe beranê
mino; me hemiyan mala xwe viritand, mal û canê xwe li
ser kir û namûsa xwe da nav lingan. Bi salan û salan em
di nav êgir de jiyan. Lê heger me di dawiyê de tiştek bi ser
xista, dîsa jî xem ne dikir, berxê mino. Hoooweh li vê
159
ecêbê kuro! Di vî şerê herî dijwar û berfireh de ji bilî tirkan,
kesî ji me qezenc ne kir. Heta bi wî Reyiskê te jî. Tew
bi ser de jî em ê nikaribin li gundikê xwe bimînin...»
Di vê gava ku gilî û gazinên xwe bi Serdêr re dikir, ji
nişkê ve newal bi şewqa cîba ku ber bi Stilîlê de diçû,
mîna lempeyekê pêket. Wî baş dizanîbû ku bi şev ji terempêlên
eskerî pê ve tu terempêl di ser vê rêyê re naçin û
nayên. Terempêl pir xurt dihat. Nêzîkayî lê kir. Wî bi latê
ku xwe dabû ber re kire yek û bi haweyê ku terempêl tije
esker bûn:

«Ha ha terorîst, terorîst!...» got, cercûrê xwe li cîba eskerî vala kir û ber bi ronahiya wê de lezand.
Cîba servekirî jî bi dengê fîşekên wî re ji rê derket û serserkî di bestê werbû. Şev bi hewara wî ve hatibû û wî jî niha wek gur didît. Lê heger wek gur jî karîba lêxista, wê mesele biqediya û bi serketa. Jê re lihev hatibû, tiştê ku xwestibû qewimîbû. Vê carê ne xewn û xeyal bû; şerekî bi kurmanciya wî bû. Ew yek û ev yek û herdu jî bi demaçe bûn. Êdî Circîs di vî şerî de divabû nereviya û temamê hinera xwe a kurmancî bi kar bianiya. Reva çi! Bi qîr, halan û navtêdanan ajot ser cîba ku herdu çavên wê ên dawî, di nav reşaya newalê de mîna du sersotan xuyanî dikirin. Ew çiqasî nêzîk bû, dengê kaze kaza birîndaran jî ewqasî di guhên wî de geriya. Piştî ku dijminê xwe nas kir, temamê lebatên wî mîna kulîlkên biharê geş bûn, xwe bi qasî dêwekî bi hêz dît, destê xwe avêt qevda xincerê, li dora xwe lîst û qêriya:
«Hêêêê! Ho, ho, hooo! Ez Ûsivê Qaso me, ez Eliyê Betê û Hemê Gozê me! Ez Eliyê Ûnis qewmê çiyê me! Ez Eliyê Ehmed im, Ehmed! Ez Îbo Begê me! Ez kilê çavên
160
Perîxanê me! De lêxe Circîsooo!...»
Yuzbaşî li wê navê bihêlin, mêrê herî mêrxas jî di vê şeva reş û tarî û vî cihê xewlecih de, wê nikarîba xwe li ber dengê navtêdanên vî kalemêrî bigirta. Bi dengê wî re mîna ku her der tije peyayên wî bûbûn, saweke wilo bi Atîlla re çêbûbû û bi carekê ve ji desthilanîn ketibû. Serê wî û çîmekî wî şikestibû. Lê ji tirsan li erdê bûbû rêsî û bi

ser de jî devê wî ketibû hev. Bi yara xwe re dîsa wê biçûya ser kaniyên Stilîlê.
Piştî ku Circîs giha cem û serê xincera xwe da textikê eniya wî, zimanê wî vebû û bi kurdî got:
«Circîs axa, ez di bextê jina te de min nekuje; min kir tu neke. Dewletê ez ji rê derxistibûm. Min aqilê xwe winda kiribû. Ez ne dijminê we bûm. Min cahilî kir. Min bibexişîne. Ez kûçikê ber deriyê te...»
Êdî ma fêde dikir. Heger ji dêvla Circîs Heso ba, ji sedî sed wê dilê wî pê bişewitiya û ew efû kiriba. Lê ev Circîs bû. Çere mere nizanîbû. Bi kurmanciya xwe dikir. Li gora kultura bav û kalên wî, mirovekî mîna yuzbaşî ewqasî destbixwîn, gava ku hêsîr biketa û bi mêrxasî lêborîna xwe bixwesta, helbet Circîs wê ew efû kiriba. Lê ji desthilanîn ketibû û bi ser de jî xwe jê re kiribû kûçik.
«Em kurmanc, heyfa xwe di hûrê gur de jî nahêlin», got û bi herdu destan heta ku jê hat xincera xwe di eniya wî de dewisand. Kela dilê wî hênik ne bû. Vê carê jî kişiya ser laşê wî û laş ketûber da ber derbên hincerê. Dû re jî mîna gur xwe dada jinika ku çend gavekî li kêleka wî a rastê dima û ketibû ber sikratan. Ji bo ku tam dilê xwe têxe cih, destê xwe li ser sênga wê pelikand û li memikên wê geriya. «Erê jin e, tifî dêlika heram!» got û dîsa berê xwe
161
da cendekê yuzbaşî. Li dorê çû û hat û tif kirê. Kela wî hîn jî hênik ne bûbû. Piştî ku got «namûsiz ewladî», bi xincerê dawişand zikê wî, zik terişand û hinav berdan erdê. Bi vê yekê jî dilê wî hênik ne bû. Xwest ku serî jî ji gewde

bike. Ne kir û got:
«Weh, ez kirî çi bikim! Mirov serê beranên wek Reşo
û Serdêr jê dike. Kûpê bênamûsê, lawê qûndekê, ew jî ji
min re mêr e, ha!...»
Di wî halî de hişt; lezand û berpal û berpal berê xwe da
Zorava.
4
Zeraqeyên roka danê sibehê di pacên qesrê re xwe
dadan ser ruyê Circîsê ku bûbû pêlîsk û goka nav lingên
eskeran. Mîna ku mozqirçk pê vede çengî wê navê bû, xûz
sekinî û bi haweyê ku diz ketine malê, stuyê xwe dirêj kir
û bi hêdîka li dora xwe nerî. Qesra wî yekser ne ketibû, lê
derî û pace û çi tiştên ku di hindurê wê de bûn hemû şewitîbûn.
Ponijî û ponijî û hema pê re jî tarîxa Zorava mîna
çemekî bêdawî di ber çavên wî re herikî. Bapîrê xwe dît û
ber pê de meşiya. Lê bavê wî derket pêşiyê. Wî destê xwe
rada û xwe li kevirê ku bi qasî metreyekê dirêj dihat,
rapêça. Kevir ji qormaxa qesrê ketibû û tîtikî sekinîbû.
Piştî bêhnekê, vê carê jî mîna ku hin xîçkên çîmê wî babidin,
zîz bû û çarmêrkî li erdê rûnişt. Lê çawa rûnişt wilo jî
rabû. Li hindur çû û hat. Li vir û wir nerî, destê xwe da vir
û wir, ruyê xwe bi dîwarên qesrê ve xijiqand, ket û giriya:
«Min ev zilma han heq ne kiribû!...»
Qesra wî Zorava û Zorava jî qesra wî bû. Bûblaniyên
162
pêşî piştî ku li Gurik, Qûzo û Hatxê bi cih bûbûn, Zorava,
Sirêçkê, Sarincê û Menderê di avakirina gundên deştê de
wek neqebekê bi kar anîbûn û ji van herçar gundan xwe bi

nav mêrsînî û deqoriyan de berdabûn. Ji bilî Hatxê, Qesra û Doda, gundên bûblaniyan hema hema hemû jî bi destên bûblaniyan hatibûn avakirin. Bûblanî eşîreke malbatî bûn. Ew ne wek omrî û mêrsîniyan bûn. Gundî jî ji wan û axa jî ji wan bû. Pêşiyên wan ji gundê Mûsîsana binya xetê û derdora wê koçî hêla Dêrika çiyayê Mazî û Wêranşehrê kiribûn û piştî demeke dirêj ji wir jî berê xwe dabûn herêma Omeriya. Birehîmê Qaso wilo digot. Zorava ku bûbû pira Serxet û Binxetê, axayên hevêrkiyan, omerî û bûblaniyan di reva li himberî ordiya Atatirk de dest dabûn hev û di ser vê pirê re derbasî binya xetê bûbûn, ji bal eskerên wê ordiyê ve careke din hatibû şewitandin. Tarîxek bûbû xwelî û Circîs jî ew xwelî bi ser serê xwe dadikir. Di eslê xwe de dîsa jî bi sihûd û qubal bûn. Bi malbatî herdu salên wan ên dawî pir pîs bihurîbûn û hema çawa ba piraniya malbatê hîn jî li ser lingan bû. Yuzbaşiyê ku xaniyên wan şewitandibû, dikarîbû hemû bi ser hev de kuştibana. Ne kiribû. Di wê kelkela germa havînê de bi seetan li wan xistibû, av ne dabû wan, lê di devê wan de jî ne miztibû. Dest avêtibûn hin keç û jinan, lê neavêtibûn mêran. Ev hemû jî baş bûn. Heger tiştekî wilo bi serê Circîs de jî bianîna, wî çaxî wê çawa bûba gelo? Li gelek deveran bi jinan re dest avêtibûn mêran jî. Ev eskerên tirkan bûn û vî eskerî hîn ji heyamên osmaniyan de li meydanan mirov li qazoxan xistibûn. Li ser pira Dirînayê, pira Reş a Diyarbekirê û herwekî din gelek kes bi qazoxên wan miribûn. Bi sed hezaran û heta belkî bi milyonan insan

kuştibûn. Li Dêrsimê bi hezaran mirov tev li zêc û zarên wan di çemê Mûnzûrê de werkiribûn û ewqas jî di şikeftan de şewitandibûn. «Hema di wan de çi kiribana, hebûn dîsa jî ji hemû tiştî xweştir bû.» Ev yeka han belkî wek neheqiyekê li Circîs bê. Ew jî ji ber ku wî bi her haweyî xwe kurdekî temam didît, şeref û namûsa kurmanciya kevin di ser her tiştî re digirt, her tiştê wî binpê bûbû û hîn jî li jiyanê bû. Ji bo dîndarekî mumin çawa ku mirin xelateke xwedayî bû û bi mirinê re hîn bêhtir nêzîkayî li xwedayê xwe dikir, ji bo Circîs jî maneya mirinê ewqas bû. Lê ma her kes ne Circîs bû helbet; her kes bi qasî wî ne girêdayê kultura bav û kalan bû; her kesî mîna wî li bext û şexsiyeta ku wî diparast ne dinerî. Insên hevdu dikuşt û talan dikir. Wî ji zû de dev ji wan tiştan berdabû û li xêrxwaziyê geriyabû. Insên dinya guhertibû û kiribû wek xwe.
Û wî jî xwe li ser dinyayê dixeyidand û gotinên çort bi dewletên mezin re dikir. Insên xwarina nebat dixwar, wî ne dixwar. Insên ava dermankirî vedixwar, wî venedixwar. Li gora wî, dinyayê qîma xwe bi xerebiya insên ne anîbû. Dema ku insên bi bombeyên xwe dar û daristanên wê dişewitandin, çiyayên wê diherifandin, bi karxaneyên xwe çem û kaniyên wê jehr dikirin, wê jî car carê xwe di bin insên de xerq dikir. Dinya dayik bû û insên jî ew dayik beravêtî kiribû. Ji ber hindê her tişt nîvçe diafirî, nîvçe mezin dibû û nîvçe dimir. Insên dinya ji lezet û bereketê xistibû û ji hemû hêlan ve xwe biribû helakê. Circîs wilo difikirî.
Zoraviyên ku xew bi çavên wan ne ketibû ji girî ziwa

bûbûn. Zarok jî wilo. Zarokan heta sibehê xewa xwe bi care war û qîje wîjê derbas kiribûn. Her kes mîna mirîşka
164
ku bi êşê bikeve nehişî tevdigeriya. Dengê her kesî ketibû. Mirov digot qey ji bin ferşan derketibûn, madê her kesî mîna ê miriyan bû. Di nav wan de dîsa ê ku ji derb ne ketibû Circîs bû. Tirsa wan a îro ji a doh jî bêhtir bû. Bi rohilat re gelek terempêlên eskerî di gund re derbasî ser termê yuzbaşî û dostika wî bûbûn û hîn jî diçûn û dihatin. Helîkopterên skoskî bi xezeb li çiyê digeriyan. Her bêhnik dikarîbûn sarox biavêtana Zorava yan jî dereke din. Li hin gundan gelek caran wilo kiribûn. Gava ku çekdaran bûyer dikirin û eskeran jî ew zeft ne kiribana, îcar kerba xwe di devereke din re derdixistin. Ev kêlîk pir talûke bûn û zoravî jî bi vê çûn û hatina li jêr û jor tam ji desthilanîn ketibûn. Qemyona ku Cidhên ji doh de anîbû li wir sekinîbû.
Lê yekî jî bîr ne dibir ku xwe biavêjênê û ji gund dûr bikevin. Hema hema rê ne dibirin ser tiştekî xwe. Lê Circîsê ku bûbû Xocê Xizir, dîsa bi hewara wan ve hatibû.
«Hêêê!...»
Mîna dîkê danê sibehê hilkişiyabû ser dîwarê êxur û ji wir bang dikir:
«Bila dengê min bê we hemiyan! Bi lez û bez xwe bidin ser hev û li qemyonê siwarên. Pêşî zarokan ji ber xwe bikin. Aman hûn zarokên xwe ji bîra nekin!...»
Bi dengê wî re careke din xwîn bi her kesî ve hat, mîna keriyê pezê ku gur têkeve nav, li hev kom bûn û ber bi qemyonê de beziyan. Lê Circîs jî di vê navê re dîsa tiştekî

ku mirov wê bîr ne biriba kir. Da navtarên gund û ax û terabêlk bi ser xwe dakir. Li hindama odeya Heso xwe şilfîtazî kir, çû ser tingê Sarê, tingê wê bi dest û lingan kola û xwe di nav zibil de veziland. Zibil di serê xwe da û da û xwe di nav de gevizand û gevizand. Piştî ku ew laşê xwe
165
ê bi xurûr bi zibil baş firkand, li qûn rûnişt:
«Lê lê Sarêêê!» got û bi haweyê ku tarîxê mehkeme bike li mala wê temaşe kir. Sarê pêrgî wî hat. Heso jî bi dû de bû. Li devê deriyê hewşê sekinî, destê xwe wek rimekê bilind kir û hejand:
«Eferim ji pevçûn û serhildana te re, Circîso! Heta ku kurmancên mîna te dilsoz, mêrxas û camêr hebin, romî wê nikaribin pişta vî xelkî bînin erdê!»
Circîs bi dengê wê re çeng bû wê navê û li dora xwe zîzbû:
«Erê Sarêêê! Bila ez îro bi tenê mabim. Lêbelê sibehê wê ne wilo be, ez ê çavê wan û sed bavên wan derxînim!»
Dû re jî zendên xwe wek bazê ku ji baskên xwe birîndar bûbû û xwe ji zinêr berdida, ji hev vekirin û ber pê de meşiya. Meşiya û meşiya, da dû û ji vî hindurî derbasî hindurê din bûn.
Ro gihabû daniyan û bayekî hênik bi ser Zorava de dixurbilî. Lê Zorava jî bi qasî Circîs çûbû xwarê. Mîna qarotên tûmê tûtinê, belavbûyî li erdê veziliyabû. Ba çendî hênik û xweş ba wê bûba çi? Bêhna goştê heywên û insanên şewitî têkilî hev kiribû û di navtarên gund de dida hev. Tîman termê yuzbaşî û yara wî rakiribûn Nisêbîne. Bi

sedan esker û tîman girtibûn çiyê û qul bi qul li nav gundên wêrankirî li çekdaran digeriyan. Deng ji helîkopteran biliyabû. Ji bilî her çend malên pîberan, her kesî di qemyonê de cihê xwe girtibû û li bendî kengî wê Circîs bihata sekinîbûn. Circîs jî di kavilên Sarê de ji zindî û miriyan civatek mezin li xwe civandibû û sêl germ kiribû. Heger Hesûk pê ve ne çûbaya, kî dizane bê heta kengî wê bi wî rengî dewam kiriba.

166

«Yabo ev tu dîn bûyî, te xwe şilfîtazî kiriye?» got û ew ji milan de hejand.

Wî jî mîna ku hîç tiştek ne qewimî bû, bi herdu destan ruyê xwe firkand û got:

«Lawo, ma we xwe ji çûnê re hazir kir?»

Wî ew deng nebir xwe. Piştî ku got:

«Yabo, bêhna mirinê ji te tê» û ziq li herdu çavên wî nerîn û tiştek ji çavên wî fêhm ne kir, vê carê jî:

«Yabo, ka demaçe û xincera te?» got û li dorê çû û hat. Yabo tiştek li xwe çênekir. Rabû ser xwe û ji odeyê berê xwe da hewşê. Hesûk dev jê berneda. Rahiştê, ew bi sênga xwe ve hişk dewisand û devê xwe xist kerka guhê wî:

«Yabo, tu şevder mabû. Lê bêhna pûş û pelaxê, qelêç û şevê ji te nayê. Heger ez ji xwîna te bim û li te hatibim, wê ev şika min jî rast be: Te hin kuştine. Him jî hinin pir mezin! Deka bêje ez xulam», got û ha ha ew maçî kir. Zoraviyan li wê navê bihêlin, vî Circîsî dixwest ku biçûya ser sûra Diyarbekirê û di hoperlorê de bûyera şevê

din ji kolordiyê re bigota:
«Hêêê romîno, li min guhdarî bikin! Ji welatê me derkevin.
Em kurmanc, heyfa xwe ji tu kesî re nahêlin. Min
qomandarekî we kuşt û ên bi dû me de jî wê sibehê başqomandarên
we bikujin. Û heta bi Reyisê dewleta we û Reyiskê
me jî...»
Lê baş pê dizanîbû ku wê neserifanda û tenterûs sax jê
bernedabana.
Circîs dîsa wek xwe kir. Ew sirekî mezin bû û ji wî pê
ve tu kesî wê jê çêtir nikarîba ew sir bi xwe re hilgirta.
Mahdê xwe tirş kir:
167
«Ez ev kevjalê haaa, ez ê karibim kê bikujim! Min
berde, devê xwe bigire û zû cilên min bîne!»
Ew berda, devê xwe girt û di hikmê du deqîqeyan de jî
cilên wî pê ve gihandin. Lê niha êdî baş pê dizanîbû ku
bavê wî hin kuştibûn. Cilên bavê di xwînê de mabûn.
Circîs piştî ku cilên xwe bi lez û bez li xwe kirin:
«Bide dû min», got û meşiya.
Hesûk da dû.
Circîs bi haweyê ku êdî tu carî wê nema Zorava bidîta,
mal bi mal li malên wêrankirî geriya. Ji her malê rahişt
zixurekî, maçî kir, bêhn kir, bi xwe re hilanî û xatir xwest.
Dû re jî li dora Zorava geriya û hey geriya. Êdî ev hilm û
têhna wî a dawiyê bû. Melkemot destê xwe dirêjî ruhê wî
kiribû, diguvaşt û dikişand. Û ew jî di nav destên wî de ji
desthilanîn ketibû û di girî de fetisîbû. Rokê lat û taht sincirandibûn
û hêdî bi hêdî rivîn ji qelaçan diçû. Lê rivînên

ku ji canê Circîs bilind dibûn ji dûr ve jî xuyanî dikirin.
Berê xwe ber bi qemyonê de vekir. Çawa ku vekir wilo jî
mîna pelên çilo lerizî. Nikarîbû bimeşiya. Hesûk ew himbêz
kir û bi lez û bez çû. Hemiyan lê dinerî. Kula wî rê li
ber kula hemiyan girtibû û di dilê hemiyan de rûniştibû.
Her kes li halê wî digiriya. Heta bi kûçikên ku li wan
navan bêkes û kûs mabûn û herwiha dizûriyan jî.
Piştî ku li ser daxwaza wî Hesûk ew xist hindurê qeresêleyê,
mîna ku tiştekî pir girîng li dû xwe hiştibû peyivî:
«Înşeleh we bêr û bivir ji bîra ne kiriye! Ez baş dizanim
ku em ê bi rêyan de hevdu veşêrin, lawo.»
«Me anîne, lê me ne ji bo ku em hevdu veşêrin, ji bo
lidarxistina konan me anîne», Hesûk got û bi lez xwe
berda ba şifêr.
168
Deng bi qemyonê ket, Cîrcîs qêriya! Qemyon meşiya,
Circîs kire hewar hewar û bi haweyê ku bi destê Zorava
bigire û bi xwe re bibe, destên xwe ber bi gund de dirêj
kirin û wilo destvekirî çû û çû!
5
Rêya Îpekê zikê welêt qelaştibû. Jêra xwe kiribû Sûrî,
jora xwe kiribû Tirkî û mîna marekî reş ber bi Iraqê de
dikişiya. Terempêlên ku diçûn û dihatin ji gêrikan jî pirtir
bûn. Ji aliyekî ve dixan û agirê wan û ji aliyekî ve tîrêjên
rokê, zift û qîr mixmixandibûn. Hilma wê li laşê xwêniyan
digeriya û laş xiloxavî kiribû. Tirs û birçîbûnê xwe
dabû ser, di hinavên wan de gihabû hev û sergêjê dest pê
kiribû. Xew bi mirinê re bûbû yek û girtibû ser çavên

hemiyan.
Bi rê de heta ku Intabê derbas ne kirin jî kesî rehetiya
xwe nestend. Eskeran ji roka havînê bêhtir canê wan dişewitand.
Her ji sîh-çil kîlometreyekî ew ji qemyonê dadixistin,
qemyon saxtî dikirin û nasnava wan dixwestin. Ji
bilî çend kesan, her kes bê nasnav bû. Nasnav bi xaniyê
wan re şewitîbûn û eskeran jî bi wê yeka han baş dizanîbûn.
Lê dîsa jî bi seetan ew ji rêya wan dihiştin, di bin
kelkela germê de ketûber li wan dixistin û xeber ji wan re
didan. Di saxtîkirina nêzîkî bajarê Rihayê de heger ne ji
pîberan ba, tîman wê dîsa belayek mezin ji wan re çêkiribana.
Çavên xwe berdabûn ser çend keç û jinan û bi şiklê
ku li xwe bikin şev bi xwêniyan re ketin dan û stendinê.
Geh bi gotinên pûç û vala û geh jî bi zirt û lêdanê. Di eslê
xwe de tîman bi roj jî dikarîbûn ev keç û jin birevandana.
169
Ma ne ji xwe her tim direvandin û li gundan heşkere
heşkere bazdidan ser wan. Lê di vê carê de qirdê Circîs pê
ve rabûbû û li hin pîberên ku dikarîbûn emir li van tîman
bikirana, rast hatibû. Pîberên ku wê bi roava re cihê nobeta
xwe terk kiribana, keft û lepta tîman bi xwe ne xweş
anîn; giraniya xwe danîn û ew parastin. Li hin cihan her
çendî hin pîberan malê xelkê talan kiribûn û kuştibûn jî,
dest dirêjî pîrekan ne kiribûn. Û heta li wan jî ne xistibûn.
Ji xwe re gotibûn «em jî kurd in, ji mecbûrî em bûne hevalê
dewletê û kurdan dikujin.»
Qemyona koçê çiqasî bi wir de çû, taqeta karwên jî
ewqasî kêm bû. Qemyonê di a din î rojê de bi êvarkî re

xwe gihand çiyayê Sor. Di hikmê bîst deqîqeyekî de çiya
li pişt xwe hişt û bi deşta Mereşê de herikî. Niqutîbû dilê
şifêr ku hîn jî ji tîman xelas ne bûne, tîmên çend seet berê
bi dû wan de ne û heta ku negihana meqseda xwe wê ji dû
wan venegeriyana. Ji ber hindê pê li xazê kiribû û wek bê
diçû. Ji Nisêbînê heta bi çiyayê Sor şeş-heft seet rê digirt.
Zêde aciz bûbû. Lê rewşa rêwiyan jî baş xerab bûbû. Di
nav karwên de ji qemyonê pê ve ne tiştekî pevketî û ne jî
mirovekî pevgirtî mabû. Temamê firaxan di saxtîkirinan
de tewyayî û pelixîbûn. Ard bi ser alavan dabûbû û li kincên
wan vedabû. Herdu çewalên genim çiriyabûn. Pêncî û
heft kes bûn û piraniya wan jî ji zarokan pêk dihat. Mîna
zerzûlên ku li ser daran dilûstin, xwe bi ser hev de qurnisandibûn
û hinavên xwe diguvaştin. Hemiyan jî dixwestin
ku li dereke bi star ji xwe re bisekiniyana û hilmek bistendana.
Bêhn bi goştê mîha ku pîberan kiribûn qelî ketibû û
wilo xwaribûn. Goşt bûbû jehr û li canê wan geriyabû. Û
bi ser de jî sar û germê li zarokan xistibûn. Dikirin care-
170
car, vedirşiyan û bin xwe dilewitandin. Zarokên ji deh
salan û berjêr de hema hema hemû jî zikêşî bûbûn. Hin
mezin jî bi vê nexweşiyê ketibûn. Lê ewan destava xwe bi
haweyekî din dikirin. Li qawîşên tûgaya Mêrdînê, girtiyan
darî çavî hev di bîdonan de berdidan. Van jî wilo berdida.
Circîs ev aqil dabû wan. Di nav hemiyan de rewşa
Perîxanê a herî xerab bû. Roja ku eskeran girtibûn ser
gund, ji xwarinê biliyabû û bi şev ketibû ber mirinê. Sikrat
dikir. Lê heta ku qemyonê Nizîpê derbas kir jî car carê bi

xwe şiyar bûbû û nehişî peyivîbû. Niha zimanê wê şikestibû û di nav çepilên Circîs de dîsa ketibû ber sikratan. Ji serî de Circîs xwe jê qut ne kiribû. Di qeresêleya qemyonê de lihêf lê pêçabû û herwiha li ber serê wê rûniştibû û bi paçik av guvaştibû devê wê. Niha ew av jî êdî nema diçû xwarê. Kutkuta dilê wî bû. Di dawiyê de xwe ne girt û bi kazewaz gazî şifêr kir:

«Li cihekî bi av bisekine, hal di kesî ji me de nemaaa, nemaaa!...»

Şifêr piştî ku bi qîrwîra pîrekan re sekinî:

«Em hîn jî di nav mayinan de ne, em derbasî Tirkiyê ne bûne, argûşkan bi ser hev de bişidînin, seetek rêya me maye», got û pê li xazê kir.

Şifêr li Nisêbînê rûdinişt. Zilamekî navser û bi qasî betlekî xişin û dirêj bû. Simbêlên wî li pişta guhên wî diketin. Dema ku ji herêmê koçê hîn dest pê ne kiribû, wî di navbera gundên Cizîrê û Nisêbînê de dolmîşeke tertoqî diajot. Xelkê navê wî kiribû «Mencenîq.» Ew jî ji ber ku carekê dolmîşa wî bi rê de xerab bûbû û wî bi xwe dolmîş kişandibû heta bi bajêr. Di dawiyê de dev ji dolmîşê qeriyabû, dîsa berê xwe dabû nav tirkan û dest bi pêxwasiya

171

xwe kiribû. Vê carê jî bi pereyên ku bi pêxwasiyê dabû hev, qemyoneke ford kirîbû û xwe li ticaretê şidandibû. Ji nav kurdan pez û dewar bi pereyekî avêtî dikirî û bi pereyekî hêja li nav tirkan difirot. Mirovekî têra xwe merd û bi cesaret bû. Hevalê Cidhên ê qumarê bû. Cidhên xwe avêtibû mala wî û bêyî ku qurûşekî jê bistîne hatibû bi hewara

wan ve. Hatina wî bi xwe mêraniyek mezin bû. Her şifêr nikarîbû bi a ku ew pê rabûbû raba. Çend şifêr li ser wê yeka han hatibûn kuştin.
Perîxanê felek li serê Circîs gerandibû. Xeyalên wî qut qutî dikir û her qetek bi derekê de diavêt. Rê ne dibir ser tiştekî. Li her tiştî bi hev re difikirî û tiştek bi tiştekî ne dixist; diqurquçand, nêvcî dihişt û pê lê dikirê.
Em bi vî erz û eyalî ve bi ku de diçin? Bi tahtilerdê de! Vê carê wê çi bê serê me? Ma wê çi û çi neyê «looo!»
«Li min qirikê, Kalo dîn bûye! Kalo, Kalo!» Durê lê nerî û got.
«Hişşş, qut bike!»
Qut kir.
Zorava li ku ma? Niha çi bi serê wê kirine? Ma wê hîn çi bikin jê, çi tê hiştin «Circîsooo!» qêriya û ricifî.
Dura ku çavên wê li ser bûn, ber pê de pengizî:
«Li min porkurê, Kalo aqilê xwe berdaye!» got û xwe lê gerand.
Kalo ew bi wir de heliqand, «keçê bela xwe ji min veke, weh!»
«Temam, temam xwe aciz neke, ez bi qurba...»
Em bê pere ne; bê kinc û qût in. Va ye Perîxanê jî dimire. Naaa, kuştin, kuştin!... Ez ê kengî bimirim? Na, na, na, behsa mirina xwe neke! Bi haweyê ku tu ê her tim bijî,
172
bifikire. Em bi ku derê de diçin? Em bi ku derê de diçin? Haho, em diçin nav «tirkooo, tirkooo!» got û kulmek di ber xwe werkir. Lê hema pê re jî li Durê nerî. Durê dengê

xwe ne kir.
Aniha Zorava li kîjan aliyê min dikeve? Li cihê ku ro hiltê, Zorava li wir e, li wir e!... Erê ro ji ku hiltê? Ez çi zanim. Tu Zorava man gelo? «Zorava xerq bûûû! Zorava çûûû! Wey li minêêê!»
Qemyonê piştî ku çiyayê Gêwir tibabekî li dû xwe hişt û rê dagerand, her kes tirsiya. Circîs jî. Vir nêzîkî bajarê Osmaniyê bû. Rêya ku qemyonê dabû ser, di nav erdên pînekirî re diçû gundekî. Kortik û koncalên di rê de, qemyon mîna kodika êş dihejand û êşa ku di hinavên koçberan de civiyabû tevdida.
Circîs pirsî:
«Hesûk, Cidhan lawo hûn ê me bi ku derê de bibin? Lawo em hemû ji derb ketine. Bi vî haweyî wê dil, gurçik û kezebên me hilqetin. Hêdî bi hêdî, hêdî bi hêdî...»
Hesûk û Cidhan li tenişta şifêr rûniştîbûn. Herduyan bi hev re bersiva wî dan:
«Yabo, hema çar-pênc deqîqeyekî din em ê bisekinin, bêhna xwe berdin û dîsa vegerin ser rêya xwe...»
Circîs fêhm kir bê çima wilo kirine. Dengê xwe ne kir. Qemyon li nêzîkî gund li ber kaniyekê sekinî. Avtêzanek jê bi wir de bû û çem jî di tenişta kaniyê re diherikî. Niha reş ketibû erdê û li vî gundê ku lempeyên elektrîka wî diçirisandin, mirovên mîna Circîs di nav kufletên xwe de rûniştîbûn û şîva xwe dixwarin. Pîrejinên mîna Perîxanê xwe li ser textên neqşînî paldabûn; bi xeyalên keçkaniya xwe re firiyabûn ezmên û di nav perên hewran re bi dil-
173

darên xwe re ketibûn gevzekê. Di rê de çûn û hatin tune bû. Ne reşaya insanan ji gund xuyanî dikir û ne jî dengek jê dihat. Lê dengê zûrezûr û ay û ûyên zarokên ku di himbêza dayikan de jî ewleyî bi stara xwe ne dianîn, bi xwişîna pelên daran re li ser gund belav dibû. Zarokan dilê dayikan dax didan. Gotinên herî xweş ji wan re digotin û dîsa jî haş ne dibûn.

«Dilê dêya xwe megrî. De ka hiş be bê ez ê çi mizgîniyê bidim te:

Li wî cihkê ku em mala xwe dibinê jî kûçik hene, hiii... Pisîkên xweşik li hêviya te neee... Berxik, karik, mîh, hemû hemû hemû hene. Wey ker jî, ker! Û golik. Li ser tingan mirîşk, dîk û elok tijjjene. Ê ne tu nizanî bê keroşkên li wir çiqasî mezin in, mezin! Ez ê ji te re çar keroşkan bikirim. Ha, dû re tu û bavê xwe hûn ê bi xarên zindoqî, bi kortê bilîzin. Dû re jî bi kaban. Ez û tu êm ê herin bajêr û ez ê ji te re şerwalekî, qutikekî û şekalekê bikirim. Bila qutikê te sor û pantorkê te jî reş be. Erê erê, ez ê şekirê qursikan û qidaman jî bikirim. Û benîşt jî, hi?...»

Hinavên Circîs bi ser Perîxanê de mîna bixûrê dişewitîn. Lê dinerî ku çawa dimire û nikarîbû tiştek jê re bikira. Bi tenê hew ji destê wî tiştek dihat, ew jî ku nexwara, venexwara û ji ber serê wê ranebaya. Ev hemû kiribûn. Lê dîsa jî xwe wek kêzikekê didît. Her kes ji qemyonê daketibû, rivînên canê xwe bi avê sar dikirin û wî jî ji Perîxanê re ha ha distira.

«Apê Circîs, ez xulam de ka were dakeve. Te bi xwe re em hemû helikandin. Tiştê ku Xwedê gotiye betal nabe.

Tu bi wê eksa xwe berberiyê bi Xwedê re jî dikî. Kuştin û girtin, malwêranî û koçberî qedera me kurdan e. Xwedê li
174
eniya me wilo nivîsandiye. Dakeve da laşê te bigihê axê û bêhna te derkeve», Mencenîq got û li ser pêyan li bendî bê ka ew ê çi bibêje sekinî.
Circîs bi hêrs hema wilo pê re:
«Wê laşê min ji axa wan bilewite», got û qut kir.
Mencenîq bi şewlaqê xwe ê tije av bi qemyonê ve hilkişiya, şewlaq da dest û dewam kir:
«Tu çi bibêjî heqê te ye. Zor e, pir zor e! Lê de ka em çi bikin, çi ji destê me tê, çî me heye? Sîlehên temamê dinyayê di destên wan de ne. Benqeyên wan ji dolarên emerîkiyan tije ne. Û dewletên ewrupî jî hemû li pişt wan sekinîne. Ne Xwedê erdhejekê li welatê wan radike û ne jî bi xeletî atomeke rûsî bi ser wan de tê. Bêhna xwe fireh bike. Qey rojekê wê deriyekî xêrê li me kurdan jî vebe...»
Piştî ku careke din têr av vexwar, pala xwe da dîwarê qemyonê û mîna aliman peyivî:
«Di vê malkambaxiyê de ez ne ê pêşî me. Û ez baş pê dizanim ku ez ê ne ê dawî jî bim. Di vê rêya çûn û nehatê de eskeran dest avêtine jinên mêrên wilo ku ez ne diçûm cuherê hespê wan. Ez li ber wê nakevim. Em qels in û ew xurt in. Em ji ber xwe fedî dikin û ew ji ber xwe fedî nakin. Lawê min, a ku ez behitandime û ez ji per û bask xistime tiştekî din e: Dewleta tirkan qetilameke ku hîç naşibe a filehan li me rakiriye. Bêyî ku di ewraqan de binivîsînin, me bikin kafir û bi tenq û topên xwe êrîşî ser me

bikin, bi miletî em dane ber xwe û me qir dikin. Ev qetilameke wilo ye ku em pê sûcdar û ew jî pê mafdar dibin, lawo!»

«Rast e, bi rengekî mafyayî kurdên herî zana dikujin. Him dikujin û him jî bi term re diçin ser gorê.»

175

«Xwezî hema tenê bi kuştinê ba, lawo.»

«Erê erê, me di hepsan de dirizînin jî.»

«Xwezî hema tenê bi girtin û kuştinê ba. Hêlînê radikin, hêlînê! Kew bi kuştinê û çêlkew bi girtinê naqelin; bi rakirina hêlînê diqelin. Wilo nabe, divê rêyeke vê hebe...»

Mencenîq bêyî ku rêyekê jê re bibîne, xwe ji qemyonê avêt û bi bazdan ber bi kaniyê de çû. Du zilam ji gund hatibûn û bi karwên re dixeyidîn. Dengê tirkî ê eskeran bû û hemû jî ji ber eskeran reviyabûn. Piçûk-mezin her kes ji tirsan diricifî. Heger şifêr bi Hesûk û Cidhanê ku li himberî wan ketibûn temenê ve ne çûbaya, kî dizane dibû ku van herdu zilaman ji bêcesaretiya wan cesaret bigirtana û her kes bidana ber pehîn û kulman. Mîna ku bi ser kûçikan de hildibûn, bi ser wan de hildihatin.

«Hûn doza çi dikin!» xwe bi ser wan de zirzitand û got. Bi dengekî nizmik herduyan bi hev re bersiv dan:

«Vir ne cihê ku mirov bi ewqase insan lê bisekine. Der û dor hemû bexçe ne...»

Mencenîq ne hişt ku dirêj bikin:

«Îcar çi yanî! Ma di destê hinekan ji me de xiyarên we hene, hi? Ka çend kes ji me ketine bexçeyên we? Ma qey em avê jî venexin, hi? Ma em ê ji ber we bi kîjan tahtilerdê

de herin, hi, hi, hi!» got û milê yekî ji wan hejand.
Herduyan jî jê daxwarin û berevajî berî niha peyivîn:
«Helbet hûn ê avê vexwin, kesî av ji ber we ne girtiye.
Lê li zarokên xwe hayî bin ku bexçeyên me xerab nekin.
Em vê ji we dixwazin.»
Mencenîqê ku tirk wilo nas dikirin, bêhtir lê sor bû û
vê carê jî bi pêxêla yekî ji wan girt û hejand:
«Em ê têkevin bexçeyan, him bixwin û him jî xerab
176
bikin!...»
«Baş e, baş e, temam, temam», bi hev re gotin û ber bi
gund de fiskilandin xwe.
Karwanê koçê piştî sekna li dora seetekê, xwe da ser
hev û qemyon dîsa bi rê ket. Rê xweş bû, dinya hênik bû,
tirs ne mabû û karwên jî baş bêhna xwe berdabû. Mencenîq
ajot û bi hilm û pifekê re bajarê Osmaniyê derbas kir;
ket ser rêya bajarê Edenê û di bin bayê behrê re berê xwe
da çiyayê Torosê. Mirov digot qey ezman gihabû erdê.
Stêr mîna lempeyên bajêr bi ezmên ve daliqiyabûn û ji her
derê ronahî diçû. Çiyayê Torosê hewr xistibûn jêra xwe, li
hin cihan hilkişiyabû jora stêran û çarhawêrî xwe şewq bi
ezmên de belav dikir. Perçeyên hewrên belek belekî di ser
hev re diherikîn û stêran jî xwe dadabûn ser wan. Heyvê
di nav stêran de wek beyendûrekê xuyan dikir û xwe ji ser
karwên ne dida alî. Lê hay û bayê karwên ji wê seyrana li
erd û ezmên tune bû. Diponijî û giraniya hişê xwe berdabû
ser pêşeroja xwe.
Çî me heye? Em ê vî kufletê hûr û mûr bi çi xwedî

bikin? Wey liminê! Em tazî û xwas in. Heqê şekalekê bi me re tuneye. Ev hemû ne bes e, bi ser de jî zarokên me nexweş in. Gelo wê xwedî xêrek hebe ku li me bê rehmê? Weh çawa(!) Em ji ber baranê diçin ber terizê. Em ji ber eskerên tirkan direvin û em diçin welatê wan. Gelo xortên me ên li Swêdê bi vê rewşa me a dawiyê hisiyane? Hisiyabin wê bibe çi? Ma pere li ber me qîm dikin! Tiştekî me, erê tiştekî me nîne! Em ê çi xweliyê li serê xwe bikin...
Di rêya çiyê de zarok dîsa qerqilîn û dest bi girî kirin. Bayê behrê li wan ne hatibû; laşê wan demûşî kiribû, ew cemidandibûn û qolinceke dijwar girtibû hinavên wan.
177
Mencenîq di wê rewşê de êdî zêde nema dikarîbû biçûya. Di dawiyê de qemyon li ber deriyê restoranekê sekinand û mîna pisîkê xwe avêt jêr:
«Her kes dakevin, em ê li vir bêhnekê bistînin», got û bi zarokan ve beziya.
Lê çawa ku karwan bi kêf daket û berê xwe da restoranê, wilo jî di cihê xwe de sar bû û li ber xwe ket. Çend zilamên ku di devê derî de sekinîbûn ha ha digotin:
«Vir ne cihê we ye, bi dereke din de yalla, yalla!...»
«Ma ne her tişt bi perê xwe ye», Mencenîq got û taxên pereyan ji bêrîka xwe derxistin.
«Wê rengê restorana me bi we pîs bibe; bêhna we a genî lê vede û me werem bike. Yalla, yalla!...»
«Ezbenî, wek ku hûn jî dibînin, em hemû şerpeze bûne. Zarok nexweş in û ji serma diricifin. Bihêlin da em bi perê xwe çaya we a belaş bikirin û xwarineke germ bixwin.

Hema qederê nîv seetekê em ê bimînin...»
«Yalla, yalla!...»
Wan ji berê de biryara xwe dabû. Zêr jî dabana wan ew ne dixistin hindur. Mîna vî karwanî bi hezaran karwan di ser vê rêyê re derbasî herêma Egeyê bûbûn. Her karwanê ku li vir sekinîbû ji bal van mirovan ve bêerz bûbû û tî û birçî dabû ser rêya xwe.
Li gora Mencenîq, cihê gava ku bi sûretên kûçikan û nivîsên bi haweyê «her tirkek bedelî dinyayê ye», xemilandîba, ew dihat maneya ku xwedîcih tirkê herî esîl bû.
Digel vê yeka han jî dev ji devjenga bi wan re bernedida û yek ji yekê pêdixist. Di dawiyê de da nav:
«Hûn digel vê ne insanetiya xwe bêqanûniyê jî dikin. Vir cihekî ku ji bo rêwiyan ava bûye...»
178
«Zimanê xwe dirêj neke, zû biqeşite û hew!» gotin û ber pê de hatin.
Wî jî him wek wan got û him wek wan kir. Lê pîrek bi qîje wîj ketin navbera wan, ji Mencnîq re bûn mertal û ew ber bi qemyonê de birin. Di vê navê re jî Circîs rabûbû ser pêyan û ji hindurê qeresêleya qemyonê ha ha digot:
«Lawê min Silho, ma qey te xwe ji bîra kiriye ku em ji ber belê direvin? Dev ji wan zaroyên teresan berde. Vir ne cihê camêrî û mêrxasiyê ye. Vir ne welatê me ye. Vir welatê romiyan e, welatê pêxwas û bêbextan e. Ew çi ji insanetiyê fêhm dikin. Zû bajo! Beleyên ku ji paş me de tên, li pêşiya me sekinîne; bi me re ne û di nav me de ne. Bajo kurikê mino, bajo, rêya me dûr e!...»

Mencenîq jî fêhm kiribû ku dijminên wî bi demaçe ne
û wê nikarîba bi wan. Bi lez li qemyona xwe siwar bû û bi
qehr ajot. Lê hîn perên çiyê derbas ne kiribû, vê carê jî bi
dengê pîrekên ku bi dilşewatî diavêtin ser xwe re sekinî.
Seet li derdora duduyên şevê bû. Dilê Perîxana ku Circîs
ew di nav lihêfê de pêçabû û xistibû ber sênga xwe,
têra vê rêyê ne kiribû. Di çiyayên Torosê de Circîs bi tenê
hiştibû û bi haweyê ku tu carî lê venegeriya, tiştek nedîta
û tu deng nebihîsta koça xwe bar kiribû. Circîs dîsa li xwe
dixist. Lê ma wê bûba çi? Wî jî dizanîbû ku şirîka temamê
emrê wî ne bi xwe dev jê berdabû û ne jî bi xwe wê
bikarîba lê vegeriya. Care car û kaze kaza wî ne ji ber wê
yeka han bû.
«Mirin emrê Xwedê ye, lê kuştin emrê ebda ye», digot.
«Perîxana min jî kuştin!» û diberizî erd û ezmên û temamê
kayinatê.
Termê wê bi xwe re bigihanda qonaxa ku wê bûba stara
179
wan derdek bû û li wir di bin tahtekê de veşartana derdek
bû. Qeresêleya qemyonê ji insên li dev sekinîbû. Term wê
bi rê de genî bûba û bi ser de jî misilman bûn. Divabû zû
bi zû miriyê xwe veşartibana. Lê wî çaxî jî Circîs wê tu
carî ne hatiba ser gora wê, ruhê xwe bi ê wê re ne kiriba
yek û di nav bihara Zorava de ne gevizîbana. Dîsa bar
qulipîbû ser milên Circîs. Wî çawa bixwesta helbet wê
wilo bûba.
«Lawê min Hesûk, rahije dêya xwe û bide dû min.»
Hesûkê ku ji mirina dêya xwe bêhtir li ber wî diket,

rahişt dêya xwe û da dû. Mencenîq jî da dû wan. Piştî ku bi Perîxana xwe re tibabekî ji rê û qemyonê dûr ket û di talda latekî mezin de rûnişt:

«Li vir deyne», got û cihê xwe û wê xweş kir.

Danî û bi hirmet li himberî wî sekinî.

«Min û wê bi tenê bihêlin û here di nav kuflet de rakeve. Em ê heta sibehê li vir bin. Ha, zarokên bêhal hemiyan bibin şifêrmehelî. Bila Cidhan jî bê ba we. Ji bîr nekin, qemyonê ji rê derxînin.»

Çawa ku ji cem çûn, lihêf li xwe û xatûna xwe pêça, ew lorand û bi dengekî nizim ji aş û baş de dest bi stranan kir. Mencenîq bi qasî bavê xwe jê hez dikir. Heyranê pevçûna wî bû. Gotina wî ne kir dudu. Qemyon ji rê derxist û mîna ku tiştek ne qewimîbû li cihê xwe pal da. Lê hema pê re jî çeng bû, rahişt herdu betaniyên xwe ên razanê û xwe li Circîs girt.

«Lawê min, na na ez naxwazim, bi ser hinan din dake!»

Wî guh nedayê, betanî di temtêla kitana ser birînê de lê pêçan û bi îske îsk ji cem da rê.

180

6

Ro derketibû lê hîn jî di pişt çiyê de bû. Bayê ku bi banga sibehê re rabûbû, katik û striyên darên çaman ji erdê radikir û bi ser qemyonê de diavêt. Bayekî hêwî û ewqasî jî cemidî bû. Hewran girtibûn ser çiyayên himber, barana xwe li wir vala dikirin û bi vî alî de diherikîn. Xew li karwên giran bûbû, lê xew bi çavên Circîs hîç ne ketibû.

Şeva xwe bi stran, çîrok û civata zoraviyan derbas kiribû. Ji rûniştinê çîm, rihn û lingên wî tevizîbûn. Çend carekî rabûbû ser xwe û li dora Perîxanê geriyabû. Bi roj ji bo wê tiştê ku wê bikira, bi şev li hemî fikirîbû. Biryara xwe dabû û ji bo ku li biryara xwe nequlipiya bi mêrxasiya Sarê sûnd xwaribû. Mêrxasiya wê bûbû sûnda wî a herî mezin.

Piştî ku du-sê dengan gazî karwên kir û kesî bersiva wî neda, ew bi xwe çû. Xwest ku bi qemyonê ve hilkişe û li rewşa ên di qeresêleyê de binere. Xwe du-sê caran ceriband. Nikarîbû. Bi dizî pê li derenceka deriyê şifêr kir û di camê re li hindur nerî. Bi şifêr re ser û lingên zarokên ku merş û potik bi ser wan de dakirîbûn dît. Hişê xwe berda ser wan û bi çavan ew hejmartin. Yazdeh heb bûn. Lêbelê wî heta bi heftan hejmart. Dû re jî xeyala xwe baş da ser şifêr û ponijî. Şifêr kabokên xwe xistibûn zikê xwe û rûniştkî razabû.

«Eferim, tu camêr î», got û bi hêdî lingên xwe berdan erdê.

Dîsa li Perîxanê vegeriya. Xwe bi ser de daqûl kir û bi hemd lihêfa li ser serê wê heta bi qirikê kişand. Ziq li ruyê wê nerî. Dev û çavên wê girtîbûn û ruyê wê jî mîna şimê

181

zer vedabû. Xwe berda ser çongan û bi herdu destan qederekî bi porê wê lîst û tevda. Di porê wê ê dirêj û gijikî de tayekî reş jî ne dît. Dû re jî bêyî ku lihêfê ji ser biavêje, mîna dizan destê xwe li ser sênga wê pelikand û kubasên bi kirês ve yeko yeko vekirin. Jina wî bê xeftan bû, lê li

ser newqê benekî dirêj şidandîbû. Piştî ku ew ben vekir, xwest ku ji hêla lingan ve kirês ji ser bişemirîne. Pê zor hat. Dev ji wî haweyî berda, destên xwe di bin lihêfê re dirêjî kirês kirin û kiras di ser serî re anî. Rûnişt. Bêhna wî çikiyabû. Rûniştin pê ne xweş hat. Rabû û vê carê jî xwest ku wê ji derpî bike. Piştî ku li ber lingên wê xwe berda ser çongan, li qemyonê nerî û pêjna kesekî şiyar ne kir, di bin lihêfê re bi herdu devdelingên wê girt, berê xwe jê guhert û devdeling kişandin. Bêhna wî derket. Him kesî ew ne dîtibû, Mencenîq lê dinerî, û him jî bêyî ku lihêf ji ser jinikê here derpî bi destên wî ve hatibû. Niha jina wî şilfîtazî bû û ev yeka han jî dihat maneya ku nîvê karê xwe qedandibû. Rabû ser xwe û bi haweyê ku wê li derekê veşêre li derdora xwe temaşe kir. Lê çawa rabû wilo jî xwe dada term û lihêf lê gerand. Dilê wî ne ket cih. Bi keviran ve bazda û di hikmê du-sê deqîqeyan de hawêrdorên lihêfê di bin kevirên girs de hişt. Niha piştrast bû. Babîsokê jî wê nikarîba ew lihêf ji ser xatûna wî bifiranda. Deng ji qemyonê hat. Mencenîq bi haweyê ku wî bi xwe bihisîne derî vedikir û tevdigeriya

Circîs berî wî peyivî:

«Lawê min, ez dizanim ku rêya me hîn pir maye. Îcar hema xwedê bikim te hinekî çavên xwe nerm kiribin.»

«Apo mereqan neke, ez têra xwe razam», got û ber pê de hat.

182

Circîs li ser pêyan sekinîbû. Bêhêvîtî ji her der wî dibariya. Hêviyên wî ên ji bo jiyana li Izmîrê bi carekê ve rût

û beyar bûn. Ji bajarên tirkan pir ditirsiya; bajar mîna zikê cenewaran didît. Dihejhijî. Bi mebesta ku heja xwe nede der, destên xwe xistin kêlekên xwe, li ezmên nerî û tena tena got:
«Ma dereke ku mirov karibe li derdora Izmîrê lê bi cih bibe tuneye gelo? Divê hebe. Bajar bê gund û gundik nabin.»
«Apo, heye heye. Hemû hene»
Veciniqî:
«Heye, ha!» got û bi haweyê ku dilê xwe têxe cih ziq li devê wî nerî.
«Nîvê emrê min li Izmîrê, Antalya û li Stenbolê bihuriye. Ez bi salan li herêma Egeyê mame û her derê wê qul bi qul nas dikim. Ez him zimanê tirkî ji tirkan bêhtir dizanim û him jî Tirkiyê ji wan çêtir nas dikim. Wilo li biraziyê xwe nenere apo, ez ne hindik im. Ez di xortaniya xwe de ne yekî bi henek menek bûm. Min devê wan diçirand. Ji bilî qewadiyê, qenc-xerab, hema hema ez dibêjim tiştek ne maye ku min li nav tirkan ne kiriye.»
Ev ji bo Circîs tiştekî nuh bû. Wî bi ewqasî wî nizanîbû. Bi destê xwe re serê xwe jî hejand:
«Ji bilî qewadiyê çawa yanî?»
«Erê ma ne ji xwe, mirov di tirkan de çi xerabiya ku ji dest mirov bê bike baş e. Ew ji wê fêhm dikin. Bi karê hemaliyê, siwaxkirinê, xerckişandinê, danheva fistiq û pirtiqalan û nizam çi û çi mirov nikare bigihê derekê. Ez di van karan de pir xebitîm û min qurûşek bi dest ne xist. Erê, ew zir bajarên wan bi qeweta zend û bendên me kur-

dan avabûn. Bi me him ava dikirin û him jî em li derve radizandin. Min dît ku wilo nameşe. A ku min dikir bi nan û zikê bû. Min dest bi dombelacitiyê kir. Piştî ku karê min baş çû û pê re jî çavên min hinekî vebûn, min kar mezin kir. Min çend hevalên mîna xwe peyde kirin û me dest bi diziya malên şirketan û şelihandina dewlemendan kir.»
Circîs ne ji dil beşişî:
«Waweyzê, de ji xwe re lê binerin bê ji min re çi dibêje! Ev îro çend roj tu bi me re yî, te ev aqil daye zarokên me?»
«Ez vî aqilî bidim wan wê bibe çi yanî. Apo, ma her kes dikare wek min bike? Xwezîka bikarîbana» û destê xwe ber bi qemyonê de vekir, «Malik avayo, dema ku ewqas insan bikaribin wek min bikin, ma wî çaxî dawî li pereyan tê! Bibexişîne, ez hêvî dikim ku cenabê te min çewt fêhm neke. Dewlemendê herî mezin qewadê herî mezin û di eynî wextê de jî camêrê herî mezin e. Bi qeweta pereyan mirov dikare bibe her tişt û qencî û xerabiya herî mezin bi insên bike.»
Circîs digel ku li gotina xwe poşman bûbû, fedî jî kir:
«Lawê min, tu rast dibêjî, wek te ye. Her kes nikare xwe di ser kevirê mezin re biqevêze. Pere polayê dihilîne; bi pereyan camêrî dibe.»
Mencenîq ji cihê ku lê sekinîbû dewam kir:
«Apo, îcar xwezî te bidîta, di wextekî kurt de em di nav pereyan de man. Ax ji destê vî aqilê min! Pereyên ku dihatin wilo jî li qumara min diçûn...»

Circîs mijar guhert:
«Ma te û zarokan we çi xist serê hev?»
«Wek çi?»
184
«Wek gelek tiştan.»
«Mesele?»
«Berî hemû meseleyan, niha em ê li ku bi cih bibin?»
«Min cihekî tam li gora we dîtiye. Hesûk jî wir nas
dike. Em li ser pir peyivîn. Gundekî hema li binya Izmîrê
ye. Jê re Doganlar Koyu dibêjin. Berê gundê tirkan bû, lê
bi destpêka koçê re bû ê kurdan. Ji bilî çend malên tirkan
ên din hemû kurd in.»
«Kurdên ku ne?»
«Piraniya wan serhedî ne.»
«Ji herêma me jî hene?»
«Erê.»
«Hema xwedê bikim ne torî bin!»
Şifêrê ku bi xwe jî torî bû:
«Çima?» got û bi balkêşî lê guhdarî kir.
«Yabo bazarî bi toriyan re nabe. Hema bên çi divê
mirov wek wan bike. Icûrê wî tal be, kurmî be divê mirov
bixwe. Pêşî mala me û omeriyan û dû re jî a xwe viritandin.
Ne li pêşiya xwe dinerin û ne jî li dawiya xwe difikirin.
Bi koç û mal dan dû Reyis û bi xwe re mala me hemiyan
li topê xistin!»
«Apo ez dibêm tu neheqiyê li toriyan dikî. Toriyan bi
Reşo û Serdêr dan dû Reyis.»
Xwe aciz kir:

«Baş e, ser çavan. Em jî bi Reşo û Serdêr û ên wek wan ketin pey mêrik. Lêbelê dû re em bi xwe hisiyan û me dev jê berda. Em di demên berê de peydûkên partiyên tirkan bûn jî. Lê piştî ku me xwe ji hev nas kir, em li dij wan sekinîn. Me di berberiyê de hevdu rezîl dikir û me malê xwe hemû li devê qomandaran, hakim û sawciyan diqeli-
185
band. Kuro ev torî ecêb in, ecêb! Dema ku ji mirov re gotin 'ez hevalê te' û bi mirov re meşiyan, hew çû, kesek nema dikare wan ji pey mirov vegerîne!»
Mencenîq pirsî:
«Çima wilo ne?»
«Ma ez çi zanim, Xwedê exlaqekî wilo daye wan. Ne dizanin li paş, ne li navê û ne jî li kêlekê bisekinin. Mêrikan hevalê hevalê xwe ne. Hevalê kê bin divê di rêza herî serî de cihê xwe bigirin. Li eskeriyê jî wilo ne. Qomandar ji nobetê pê ve tu karî bi wan nakin. Di dema nobeta wan de general jî nikarin derbasî hindurê qerargehê yan jî mala xwe bibin. 'Ben bîlmez, qomandar bîlîr' gotineke toranî ye.»
Mencenîq piştî ku di ber xwe de beşişî:
«Çawa yanî?»
«Erê lo, generalek tembiyê li ev ê me dike û jê re dibêje 'ger ez bim jî, piştî seet dehê şevê kesî bernede mala min' û general seet di deh û sê deqîqeyan de tê mala xwe. Bernedabû, ha. Ma berdide, mêrik xerabe ye. 'Ben bîlmez, qomandar bîlîr...' Jina generêl li wan derdikeve û li ber ê me digere. Dîsa bernade hindur. General ji canelametî lê

dide demaçeyê. Ma xêr dike. Ez çavên wî bixwim, eferim jê re; xwe kêm nake û lê dide tivingê. General ji ber qûna qûna dibe. Di dawiyê de pişta stuyê xwe dixwirîne, berê xwe dide qerargeha xwe û şeva xwe li wir derbas dike.»
Mencenîq dîsa pirsî:
«Apo, ev mêraniya wan ne be ku ji bêaqiliya wan be?»
«Na lawê min, na. Zanayên wan ji tiredînên wan pir mêrxastir in. Binere ez ê şîretekê li te bikim û ev şîreta min bila her tim di serê te de be.»
186
«Li ser çavên min.»
«Dema ku tu û yekî torî hûn bi hev re rûniştin û wî got, 'ez bi serê bavê te kim halo ye' û te jî got 'na, ne halo ye', wê hêrs bibe û xwe ji pevçûnê re hazir bike. Îcar bavê mino, gava ku tu ji ser a xwe daneket û wî ji te re 'hek' got, eman tu jê re nebêjî 'pek!'Yanî melkemot bavê te be jî, wê xelasiya te ji dest wî nebe. Di ber re najo. Çend kesên omerî li ser wilo kuştibûn. Wan 'hek' û van ên din jî 'pek' gotibûn û bi hev ketibûn. Ev xerab e û ên din jî zir xerab e. Ma dibû ku di hev nefiriyana. Ax ku ev toriyên me hinekî jî zanabana, ma qey mêrên wek wan hebûn! Keleh bi wan fetih dibûn, keleh!»
Mencenîqê ku ji wensa wî têr ne dibû, keysa xwe xweş kir, yek got û li dehan guhdarî kir.
«Apo, lê ez dibêm, ew toriyên me ên li wir, wê ji te re baş bin, hi?»
«Ew jî rast e. Torî tam kurmanc in. Dilê kurmancan heta ku serê wan neşike, bi hev nakele. Kurmancên me

dilkeçikî, henûn û mêşinî ne. Dilê xwe zû vedikin û zû jî digrin. Zû dikenin û zû jî digrîn. Dereng tê digihên û zû jî ji bîr dikin. Ev exlaqekî me ye, lawê min.»

Di vê navê re ji hindurê qemyonê Pîra Durê bang kir. «Ji me re derî vekin da em nîskekê ji zarokan re li êgir bikin.»

Circîs dengê wê nas kir. Durê him jina Idrîsê wî û him jî dotmama Heso bû. Jineke dirêj û girs bû; zarxweş û têra xwe jî zana bû. Bi ser Sarê ve çûbû. Bi çavên zilaman li xwe dinerî û wilo jî dipeyivî. Bi dû Circîs de ji malbatê a herî mezin ew mabû. Circîs qîmeteke zêde didayê. Li derdora heftêyî bû, lê ji emrê xwe pîrtir xuyanî dikir.

187

«Zû bi Pîrê ve herin binere bê dibê çi?» got û ber pê de meşiya.

Mencenîq bi lez çû û bi lez jî deriyê qeresêleyê vekir. Piştî ku pîrekan bi desteka keç û jinan xwe berdan jêr, Pîrê ji jor de li Circîs nerî û bi haweyê ku nav tê bide qerfê xwe pê kirin:

«Kalo, wileh te xweş distira, ha! Tu pê dizanî ku te em hemû ji desthilanîn xistin, ne? Gava tu ev bî, îcar em ê çawa bikin? Qey kesek wek Zîna te ji vê dinyaya derewîn ne çûye? Pîrê gelekî bi ser emrê xwe ketibû. Mir mir, rehma Xwedê lê be, weh!»

Circîs fêhm kir bê jê re çi dibêje. Beşişî:

«Dêya Serdêr, hîn em ne gihane Izmîrê û tu mezinahiyê ji dest min digirî. Ma wilo dibe? Bavo hinekî bêhna xwe fireh bike.»

Pîra ku li bendî gotinek wilo bû, «ha wilo ha!», got û
bi stara wî xwe ji qemyonê berda erdê.
Hesûk ji dera han bang kir:
«Zarokan şiyar bikin!»
Circîs li ser hev:
«Na na, bila razên bila razên, dev ji wan berdin...»
«Yabo de ka bise, dû re dîsa dikarin razên.»
«Lawo ma ecela me çî ye? Me her tiştê xwe ji eskeran
re hişt. Mêrikan êdî nema tên me. Ji zarokan biqere.»
«Yabo rêya me dûr e, em divê bi wext herin.»
«Na na, çiryaye û diryaye; her der ji me re bûye mêrga
Ehmedê. Lawê min wek hev e guh nedênê», got û li keçan
nerî.
Keçan agirê beroşa nîskê gur kiribûn û bi hêdî bi hev
re dipeyivîn. Yazdeh heb bûn. Heft ji wan di mala bavê de
188
mabûn; li dor sîhî bûn û kesî ew ne xwestibûn. Ên din li
gora kultura herêmê ji zû de gihabûn mêr. Mezina wan
hivdeh salî bû.
Circîs fikirî:
Berî her tiştî divê ez bi van keçan dakevim; kurmancinan
ji wan re bibînim da nebin jinên tirkan û ez bi wan pîs
nebim. Ji bo min bênamûsiya herî mezin ew e ku ez û tirkan
bibin zava û xezûrên hev û xwîna me di hev bigere.
Em kurmanc in, ew tirk in. Ew zalim in, em mezlûm in.
Ew bi devê tivinga xwe ketine welatê me. Wan em kuştine,
wan em talan kirine û dest dirêjî şeref û namûsa me
kirine. Tiştekî ku wê me û tirkan bîne ba hev qet û qet ne

maye. Baş e, gava çewt zîvirî û xort bi wan qayîl ne bûn, tu ê wî çaxî çi bikî ji van keçan? Çewt nazîvire, pîremêr hene. Lê pîremêrên vî zemanî jî êdî ji xwe fedî dikin ku bi keçan re bizewicin. Ez ê wî çaxî jî zewaca malbatî xurtir bikim. Lêbelê qismên te ên nêr deh-duwazdeh salî ne. Yeke sîh salî çawa dikare bibe jina zarokekî? Wê jinik bireve. Temam temam, ez ê xwarina wan jehr bikim. Ê ne ez ê hemiyan bi ser hev de bikujim û ez ê tu carî nehêlim ku yek ji wan jî bibe jina tirkekî!...

«Yabo ma te niyeta xwe ne guhert, em ê dêya min bi xwe re bibin yan li vir veşêrin?» Hesûk got û serê xw eberda ber xwe.

«Na lawê min na, em ê li vir jê re koncalkekê bikolin», got û çavên xwe li Durê gerandin.

Durê li ber serê Perîxanê rûniştibû û kefenê wê didirût. Kefen rûlihêfa wê bû. Rûlihêf ji qilêrê debixîbû. Piştî mijê, hewrên baranê jî ji hev belav bûbûn û rokê hêdî bi hêdî têhn bi çiyan dixist. Taht û rizde û pozê zinaran di bin

189

tîrêjên wê de dibiriqandin. Hawêrdor teyrik û tilûr difiriyan û xwe li vir û wir datanîn. Ji her derê çiyê dengê xuşîniya daran dihat û bêhna şînahiyê difûriya. Keçên ku pûş û pelax mîna liqata genim, bi hemd ji erdê hiltanîn û di destên xwe de dikirin baq, di nav dar û berên çiyayê Torosê de mîna gul û beybûnan xuyanî dikirin. Keçan li çar cihan agir pêxistibûn û piçûk-mezin her kesî xwe dabû dor êgir. Lê stûxwar bûn. Melûl melûl difikirîn. Ji xeberdan û reqepolka zarokan xuyanî dikir ku hinekî tirs ji ser xwe

avêtibûn. Xwîn bi wan ve hatibû, li bendî nîskê ne mabûn
û nanê qemirî dipûrisandin. Di nav pîrekan de Nesîmayê
pir bi mitale bû. Nehişî tevdigeriya. Wilo jî dipeyivî.
«Yabo, ma em gora dêya min li ku derê bikolin?» Cidhên
got û hema pê re jî hêsir ketin çavên wî.
Circîs da pêşiya wan û çend gavekî çû; sekinî û li
hawêrdora xwe nerî. Çavên xwe li dara herî bilind û kevnare
digerandin.
«Ha li bin wê darê», got û xwe li Durê girt.
Lê hîn gava sisêyan ne avêtibû, ji nişkê ve sekinî û gazî
pîrekan kir:
«Galoneke av bînin da em pîrê bişon.»
Durê yekser bersiva wî da:
«Na lawo na, dev jê berde. Av jî, kefen jî, sabûn jî, ax
û kefir hemû li ba min in.»
Circîs piştî ku digel pîrekan termê Perîxanê di nav xwe
re rakirin û di ber pala latekî mezin de li ser tahtê vezilandin,
ji Nesîmayê re got:
«Keça min, xwe li ber nexîne xem nake. Tu jineke
kihêl û ronahiya herdu çavên min î. Te tu qebhet ne kirine.
Tiştê ku bûye bi darê zorê bûye. Û ew yeka han jî ji bo
190
te û me hemiyan ne kêmanî ye. Tirk ev in, li tûgaya Mêrdînê
eynî tişt bi serê pîra te Sarê jî kirin, berxa min. Ma bi
tenê Sarê, li temamê keç û jinên ku dianîn wê derê ew
tişt...»
Nesîmaya ku xwe bi ser hev de guvaştibû, bi herdu
destan hişk bi ruyê xwe girtibû û bêkip lê guhdarî dikir,

xwe li ber gotinên wî ne girt.
«Ruyê min reş be, Kalooo! Li min porkurê, ez ê bi çi haweyî li we binerimmm!» got û bi girî ji ba wan çû.
Ji ber ku vê jinikê her bêhnik dikarîbû beleyek bianiya serê xwe, destê Durê di nava wê de bû. Ji her kesî bêhtir li wê difikirî.
«Kalo, ez vê keça xwe baş nas dikim. Li te çûye. Bi haweyekî divê em bikaribin ber dilê wê bigirin; yana wê xwe bikuje. Heyf e, Nesîma jineke delal e. Û him jî zarokên wê hûr in.»
«De ka tu ji min re bibêje, ma çi heye ku wê bikaribe ber li şûna destavêtinê bigire, hi? Kîjan gotin dikare wî dilê şikestî haş bike? Kîjan derman dikare wê birîna kûr rehet bike? Aaaaxxx!»
«Ev mesele bi ax û waxê safî nabe, Kalo. Bi jinikê re bide û bistîne û şîretan lê bike. Li te guhdarî dike û ji gotina te dernakeve. Ka pê re rûne û xweşik jê re bibêje bê bi a te dike yan na.»
«Ez nizanim bê ez ê çi jê re bibêjim. Ez ê ji kê re çi bibêjim û çi nebêjim, lêêê!» got û bi qehr rahişt sabûnê.
Durê:
«Dev ji sabûnê berde.»
«Hema porê wê bi tenê.»
«Dev jê berde, porê wê paqij e.»
191
«Min fêhm bike, bihêle!»
Hişt. Heger Perîxanê bizanîbûya ku Circîs ewqasî jê hez dikir, belkî heta dawiya emrê xwe jî wê ew li ser serê

xwe kiribaya. Lê wê jî mîna gelek jinên kurdan baş fêhm ne kiribû ku di nav kurdan de gava mêr hejêkirna xwe a li himberî jinê bida der, wê di nav civatê de kêm biketa.
Ji herdu hêlan de her kesî karê xwe qedandibû û niha dor hatibû veşartinê. Circîs û Durê digel hev rahiştin term û di gorê de bi cih kirin. Piştî ku gor bi axê rast kirin, Circîs çefiya xwe di bin şahra wê a botanî de danî, li keziyên darê pêça û kêreke kalanî bi guhikên şahrê re di gewdeyê darê de çikand. Ev kultureke êzîdiyan bû. Û dihat maneya heyfhilanînê. Lê vî kalemêrê ku lingekî wî li der yek li gorê bû, wê çawa bikarîbûya heyfa wê hilaniya? Li wê ne difikirî. Pê diêşiya ku çima ew kêr e, lê ne xincera wî bû. Pir dixwest ku demaçeya wî pê re bûya û li ser gora wê heta bi fîşeka xwe a dawî jî berda.
Niyeta Circîs tune bû ku bi zilaman re ji ser gorê bida rê û bi wan re xwarin bixwara. Durê piştî ku ew yeka han ferq kir, bi xwe ne xweş anî. Zilam ji wir dan alî û bi hêrs pê re peyivî:
«Kalo, ev çi hal e! Min digot qey tu bi şûran jî nayê xwarê. Rabe ser xwe da em bi hev re xwarinê bixwin!»
«Ne ji tiştekî, ser dilê min dagirtiye, ez nikarim bixwim.
»
«Ma dibe ku mirov xwarina miriyan nexwe? Ma ev ne bêhirmetî ye li himberî Perîxanê? Ma ne eyb e ku tu xwe li himberî Mencenîq û malbatê piçûk dixîni, hi? Eyb e, eyb!...»
Belkî ev cara pêşî bû ku Circîs bi urf adetên bav kalan
192

ranebûbû.
Piştî ku bi xwe şiyar bû bê çi dike, «erê erê, xebera te ye Durê», got û hema pê re xwe li komê girt.
Durê berî wî giha ser beroşê. Sênî dan ber heska nîskê û dirêjî destên keçan kir. Ji bilî Nesîmayê her kesî digel nanê tenûrê nîska wê a wek şimê xwar. Bi dû de çayê di tas û çemçikan de belav bû. Nesîmayê çayê jî venexwar. Çavên hemiyan li ser Circîs bû ku hema ji wan re çend gotin bigotana. Circîs jî piştî ku mesele fêhm kir, bûblankî peyivî:
«Keçê Durê, ma nîsk dibe xwarina miriyan?»
Wê hîn jê xerabtir kir:
«Xezeba ku tirko bi serê me de aniye, jê xuya dike; bila qebûl bike û hew!»
«Lê heger te danûkek filan çêkira, belkî bêhtir tesîra xwe li mêzêna wê a xêr gunehan bikira.»
«Lo Kalo lo, hema xwediyê mêzênê çi dike jê bila bike jê! Halê me ne besî me ye, waweylê!»
«Keçê hêdî hêdî, melayiketên li ser milên me, li me guhdarî dikin!»
«Ma me polê kê ji wan firandiye ku li me guhdarî dikin! Bila herin li eskeran guhdarî bikin, esker!»
«Wilehî heger wilo bimeşe, misilmanî li dera han, heta bi navê Xwedê jî wê di nav me de bibe qaçax. Pîrê mabû, wê jî bi meqamê wî girt û hejand», Hesûk got û hinekî teriqand.
Mencenîq xwe avêt nav wan:
«Misilmanî jî di pereyan de ye.»

Circîs «tew», got û tiliya xwe di erdê da.
Durê herdu destên xwe hejandin û dîsa bi hêrs peyivî:
193
«Erê ma ne ji xwe, gava ew xwedayê ku di rojeke teng
de bi kêrî me neyê, em ê çi bikin jê, hi?»
«Estexfîrullah ya rabbî! Pîrê li ber devê xwe binere»,
Cidhên got.
Pîrê berê xwe ber bi wî de vekir:
«Erê lawo, tiştê ku îro çend roj ketiye Pîrê di te de ba,
te ê jî bizanîbûya ku dew birê mêst e. Tu ji tevgera jêr û
jor çi fêhm dikî? Here ji xwe re araqa xwe vexwe û nepeyive!
»
«Eeehew! Pîrê bêyî ku bizanibe bê marksîzm çî ye, ji
marksîzmê peyivî. Eferim Pîrê, ez destê te maçî dikim»,
Salih got û wek eva niha dom kir.
Piştî ku Faro jî wek wî lê xist, Circîs mijar guhert:
«Ma lawo, hûn li wî gundê ku em ê herênê baş fikirîne?
»
Hesûk bi wehc got:
«Yabo ji fikirandinê êş kete serê me.»
«Dîsa jî baş bifikirin. Mirov carekê bar dike.»
«Dev jê berde, hema çi dibe bila bibe. Di ku derê re
zirav bû bila di wê derê re biqete.»
Cidhên:
«Rast e, çi bibe jî bi qasî a ku li gund bi serê me de
anîn, nabe!»
Circîs piştî ku ji kûraya kezebê keserek kişand, bêhnekê
çavên xwe li ser komê gerandin û bi dilşewatî got:

«Feqîrî tê kişandin, lê xela na. Xela li me rabûye. Em li têrkirina zik mane heyirî. Aha ev nayê kişandin!...»
Durê dengê xwe bi ser ê wî xist:
«Kalo, tu bi van gotinan kuflet qudûmşikenandî dikî. Ev çi bi te hatiye? Ji wê roja ku em bi rê ketine û hetanî
194
niha, tu mîna sofiyên mala şêx bi me hemiyan re dipeyivî. Ma di dawiyê de ne mirin e? Belê. Ji mirinê wir de cihekî ku mirov pê de bireve heye? Na. Hema mirin, mirin, weh! Wî xwedayê ku qirika ebdên xwe qul kiriye, helbet fikiriye ku qismetekî jî te re bişîne. Kes ji birçîna ne miriye, bavo.»
«Keçê çawa kes ji birçîna ne miriye! Efrîqî ji destê wê qirika te a bi qul, qir bûn. Mirov divê bisebibe. Lê em ê li çi bisebibin û nesebibin. Em ê li textor û dermanan, li kinc û şekalan, li livîn û alavan, ma li çi û ne çi! Em mihtacê her tiştî ne...»
Salih piştî ku di ber xwe de got «Kalo, bi mataryalîzmê rahiştê û bi îdealîzmê re berda», dengê xwe hilda:
«Kalo hîç mereqan neke, bi xêr hema em nuh gihan wir, ez ê dest bi kar bikim û bi şev û rojê bixebitim. Îcar gava her kes wek min bixebite, bi Quran wê dinyayek perên me çêbibin!»
Faro serê xwe wek ê dîk rakir û destê xwe hejand:
«Kar di destê min de wek hevîr e, karê ku ez ê nikaribim bikim ji xwe tuneye. De ka heta em bigihên wir, Xwedê kerîm e.»
Circîs bi haweyekî wilo lê nerî ku mirov nikarîbû xwe

li ber bigirta. Hemû tiştên xerab di nav awirên wî de bûn.
Devê xwe dagirt ku bibêje, tu jî zilam î, ha! Kuro heta
bi zêr jî di destê te de dilewite! Ne got û li mêrê Nesîmayê
Serhan guhdarî kir.
«Hûn tiştên xweş dibêjin. Mirov bikaribe wilo bifikire
jî baş e. Xwezîka min jî...»
Zarokan li jêra wan qûç rakiribûn, tibabekî jê dûr
çûbûn û bi dorê kevir diavêtin wan. Lê ne dixistin. Circîs
195
hêrs bû, xwe berda nav wan û bi kevirên yeklepî li ber
qûçan veteqilî. Wî jî lê ne xist. Durê gazî wî kir:
«Kalooo, ew ne şerê tivingê ye. Ew roj çûn, çûn,
çûn...»
«Min got da ez piçekî kêfa zarokan bînim, lê», got û
ber pê de hat.
7
Qemyon piştî nîvroyê bi rê ket. Ji bilî Hesûk û Cidhên
her kes di qeresêleya wê de rûniştibû. Circîs wilo emir
dabû. Di eslê xwe de Nesîmayê bûbû sebebê wî emrî. Circîs
li gora aqilê dêya wê tevgeriyabû û karwan dabû rûniştandin.
Şifêr bi wahc pê li xazê kir û qemyon mîna hêlanê bi
perên çiyê ve daket û bilind bû û ji vê fitlonekê derbasî fitloneka
din bû. Bi zarokan pir xweş dihat. Xwe di hindurê
qesefeke ku bi zikê ezmên ve daliqyayîbû û li ber bayê
seherê dihejhijî, hîs dikirin. Kayinat bi carekê ve li ber
çavên wan dilîst û bi dilê wan re ha ha direqisî. Her kesî
hîn nuh keysa xwe li rûniştinê xweş kiribû û dil ji kûrika
xeyalan re vekiribûn; di hindurê cîhana xerîbiyê, bêkes û

kûsiyê de li jiyaneke bi rûmet difikirî. Lê ji nişkê ve bi dengê Durê re, çelq li hemiyan ket û dîsa xwe têkçûyî dîtin.
«Wê bigirin! Wê bigirin, bigirin, bigirin!...»
Dêya wê û mêrê wê ê ku her yek di aliyekî wê de rûniştibû û çavdêrî lê dikirin, ew ji lingan ve zeft kirin.
Nesîmayê bûbû du qet. Qetek li jêr yek li jor. Heger ne ji sîperê qeresêleyê ba, van ên din wê nikarîbana ewqasî zû
196
pê ve gihabana. Sîper di zikê wê de rûniştibû. Bi pêlêkirina firên û firênan, qemyon hinekî bêserî çû û vê carê jî her kes qêriya. Di dawiyê de Mencenîq serketî derket û qemyon bê qeze sekinand.
Circîs bi hêrs bang kir:
«Ji min re zincîra qemyonê bînin, zincîr! Ez ê xanimê bi zincîrê girêdim!»
Hesûk şerît anî. Şerîteke baş dirêj û qalind bû. Rizyayî xuyanî dikir, lê qewîn bû. Nesîmayê bi carewar li ber xwe da. Lê fêde ne kir. Li ser kom bûn û ew wek pezekê vezilandin.
Pêşî herdu lingên wê û dû re jî herdu destên wê li pişt wê girêdan û gundorkî dirêj kirin.
Durê xwe aciz kir:
«Ev we aqilê xwe xwariye, wê bi vî haweyî deverin jinikê bişikin. Mirov insên wilo girênade, bavo.»
Piştî ku Circîs jî got, «qey ew terorîst e û ên din jî esker in, ji ber hindê wilo bi bêbavî ew girêdane», Hesûk fedî kir û bi wan şêwirî:
«De ka hûn aqilekî bidin me, em wilo dizanin.»

«Zêde neke û zû wê veke!» Circîs bi qehr got.
Lingên wê vekirin. Herdu destên wê li ser hev girêdan û şerît di newqa Durê re derbas kirin. Bi vî rengî jî piştî ku li hev ne kirin, vê carê jî bi tenê destekî wê girêdan û şerît li zendê Durê şidandin.
Nesîmayê careke din li ber xwe ketibû. Serê xwe xistibû ber xwe û bi dizîka hêsir dibarandin. Circîs jî jê dûr rûniştibû, dîsa dabû aqilê xwe û lê difikirî. Pê dizanîbû ku wê bûyereke wek vê biqewimiya. Lê ne ewqasî zû. Di asasê xwe de jinikê hîn ji serî de dabû der ku ne dixwest çavên wê bi kalikê wê bikeve. Her tim jê dûr sekinîbû û
197
pişta xwe dabûyê. Lê Circîs fêhm ne kiribû. Jinika ku ji ber xwe fedî dikir û kalikê xwe bi qasî çiyayekî mezin didît, di hindurê qemyonê de bi kalik re bi şev û rojan rû bi rû mabû.
Bi ajotina qemyonê re, Circîs û Durê bûyera berî niha ji bîr kirin. Li kortika çavên hev nerîn û bi stuyekî xwar û dilekî şikestî bi hev re wenisîn.
«Kalo, ma tu dibêjî wê Mîrzo bi me ve neyê?»
«Ez bawer nakim. Heger em di bîra wî de bana, di hikmê van sê-çar salên derbasbûyî de bi haweyekî dikarîbû hema silavek ji me re bişanda. Qelp derket.»
«Wilehî ne zilamekî wilo xerabe bû, lo. Ev çima wilo bê nan û xwê derket?»
«Insên şîrê xav xwariye. Gava a wî hat ber, ma qey tu kesî nas dike. Min ji wî mirovî, tu carî ew hêviya ku di rojekê de wê destê xwe ji me bibiriya, ne dibir. Bêesil derket.

»
Mîrzoyê Mitirb koça xwe rakiribû Izmîrê û li wir bi
karê xwe ê berê rabûbû. Bi hinera ribaba xwe û dengê xwe
ê bilind, li dor salekê di nav kurdan de li nanê zikê kufletê
xwe geriyabû. Lê zik têr ne kiribû. Di dawiyê de wî jî
wek gelek dengbêjên kurdan dev ji dengbêjiya kurdî berdabû
û xwe li hînkirina tirkî şidandibû. Di hikmê çar-pênc
mehan de him hînî tirkî û him jî stranên tirkî bûbû. Dû re
jî xwe berdabû kolanên tirkan û bi tirkî strabû. Lê dengbêjiya
wî a kolanan hemû jî mehek ne kiribû; tirk û kurd
lê xwedî derketibûn û ew biribûn gazînoyan. Di wextekî
kurt de, deng bi Mîrzo ketibû û li herêma Egeyê li gazînoyên
herî mezin strabû. Bi kurtî, di hindurê du salan de
dengê Mîrzo li temamê Tirkiyê belav bûbû. Heyranên wî,
198
navê wî kiribûn «Mîralay» û ê jina wî jî kiribûn «Mehtap
Hatun.» Mîrzoyê ku çekdaran li ser lêxistina ribabê û stranan
dev û diranên wî pelixandibûn û dengbêjî lê qedexe
kiribûn, him bûbû delalîkê ber dilê tirkan û him jî li Kuşadasi
û Bodrumê bûbû xwediyê restorang û avaniyan. Bi
balafiran ji vî bajarî diçû bajarê din. Li helîkopteran, bot û
mersedesan siwar dihat...
«Lêbelê Kalo, Qasimê Omerî ji Mîrzo jî xweştir distira.
»
«Erê wilo bû.»
«Wilo bû, wilo bû, lê ne bûbû xwediyê xwe û firingekî.
Belkî jî li wan welatan kêfa xelkê ji tembûrê bêhtir ji
ribabê re dihat ku lê xwedî derneketin. Ma yana çi? Temamê

alemê dizane ku dengê Qasimo ji ê Mîrzo xweştir bû.
Ma daweta ku wî radikir kesî dikarîbû rakira! Ma şerên ku wî digotin kesî dikarîbû xwe li ber bigirta!...»
«Rast e, ew jî wilo bû», got û li Nesîmayê nerî.
Nesîmayê jî pişta xwe dabû wan û li ser ku wê bi çi haweyî bikaribe xwe bikuje, diponijî. Rewşa wê li hesabê Circîs ne hat.
«Keça min, wê meseleyê ji bîr bike. Ma tu ji min mezintir û bi namûstir î, hi? Na. Bênamûsî be a min e. Keça min, baş fêhm bike bê ez ji te re çi dibêjim, tu bi kuştina xwe dijminahiya herî mezin bi me hemiyan re dikî. Bi vê kuştinê zanibe ku tu vî kalikê xwe ê xwêniyê tirko, careke din bênamûs dikî. Heger di malbata min de yekî kuştinê hebe, ew jî ez im. Erê erê, ma çi û ne çi bi serê min ne kirin! Lê dîsa jî ez va ye li ser linga me. Ji xwe ew jî dixwazin ku em kurmanc hemû bi carekê ve xwe bikujin. Lê ma dibe? Na. Xwekuştinî şiklekî revêye. Ma
199
rev bi me dikeve? Na. Bi çi rengî dibe bila bibe, em divê heyfa xwe ji wan teresan hilînin. Bi xwe ewqasî zor neyne, lê bi kîn û buxza kuştina wan tevbigere. Mêrê te wek beranekî ye, zarokên te hene û bi ser de jî sê heb ji wan xort in. Ji dêvla ku tu xwe bikujî, bi mêrê xwe û zarokên xwe heyfa me hemiyan ji eskeran hilîne. Malneketê, bi wî mêrê te ê mêrxas û van zarokên te ên sernerm, mirov dikare tabûrek esker bikuje. Aha vê bike, vê, vê», got û bi pişta destê xwe kefa destê xwe tiktikand.
Circîs hîn ji serî de xistibû serê xwe ku vê jinikê di

pevçûna xwe a nav tirkan de him şûr û him mertal bi kar bîne. Gava ku kêra xwe di darê de çikandibû, dîwarên xeyalên xwe li ser sêng û berên vê gurca xezalan ava kiribû. Nesîmayê sîh û pênc salî bû, lê ji sipehîbûna xwe tiştek winda ne kiribû. Sipehîbûna di jinê de mîna ava zinaran jê diherikî. Bi zewaca xwe re bêhtir kemilîbû. Pênc zik zarok anîbûn û newqa wê hîn jî mîna xelekê zirav bû. Tam jineke bûblanî bû. Birhûqelemî, bêvilçilagî, qirikqulingî, kezîdirêj, bejindirêj û çavşînî bû.

Gotinên Kalo cihê xwe girtibûn. Him jî pir kûr. Gotin bûbûn melhema dilê wê û tesîra xwe di ruyê wê ê zêrînî de vekirî dabûn der.

«Baş e, Kalo, hema tu çi bibêjî ez ê wê bikim», got û giriya.

Circîs bi giriyê wê xwe aciz kir:

«Negrî, biqîje û bikuje! Em dirin nav wan. Ê ne ew ê ji nav lepên me xelas nebin!» Dû re jî, «Durê destê wê veke, heger ji xwîna min be, xwe nakuje», got û wî bi xwe destê wê vekir.

Piştî van gotinan, kengî xwe dikuşt. Li a ku berî niha

200

kiribû poşman bûbû. Piştî ku bêhnekê ponijî, bi lez û bez ruyê xwe ji hêsiran paqij kir, rabû ser xwe û ber bi lawê xwe ê mezin de meşiya. Lawikê şazdeh salî, mîna tayekî kunciyê nav bistanan, zirav î dirêj kişiyabû. Bi sipehîbîna xwe li dê û bavê xwe çûbû. Ew himbêz kir û çend carekî li ser hev ruyê wî maçî kir. Hemiyan lê dinerî. Lê mabûn ecêbmayî! Vê jinikê çima wilo dikir? Kesî tiştek jê fêhm

ne dikir. Lê Circîs dizanîbû ku jinik bi karekî birehîm xelîlî rabûye. Hinekî kêfa wî hatibûyê. Him jinik ji kuştinê xelas kiribû û him jî bi destên wê heyfa Perîxanê û heta temamê malbatê hilanîbû. Niha xwe serketî didît.
Durê ecêbmayî li keça xwe nerî û ji Circîs re got:
«Kalo, ma tu dibêjî wê tiştekî bi xwe neke?»
«Na. Her tişt qediya, dev jê berdin.»
Piştî bêdengiyeke kurt, Durê gotin dîsa anî ser Qasimê Omerî:
«Kalo, li gora ku digotin, Qasimkê reben bûbû parsek û bi ezabekî pîs miribû. Du-sê rojan termkê wî li erdê mabû. Îcar gelo li ku veşartin?»
Circîs axîn kire xwîn:
«Belediyê ew di mezelê bêkesan de veşartibû. Hooweh li vê ecêbê kuro, kurmanckên me, tembûrka wî di serê wî de perçe kiribûn.»
«Ew çima?» behetî got.
«Lawên tirekan, ji ber loxeta zimanê wî fedî kiribûn. ‘Tu me di nav tirkan de piçûk dixînî’ gotibûn û ew bi lêdanê nermijandibûn.»
«Weeeh! Tiştên wilo jî li vê dinyayê diqewimin. Ah min ev nizanîbû ha!»
Piştî ku Circîs destê xwe bi qehr rakir, destê wî li çena
201
Durê ket û devê wî vekirî ma, Durê nêzîkî a ku wê wî bigota got:
«Ew ên ku ji ber ziman û urf û adetên bav û kalên xwe fedî dikin, qûndek in...»

Lê germ bûn û dan hev.
«Erê erê, li vê Izmîrka ku em diçinê, hin omerîkên me bûne zir qûndek. Keçên xwe nadin hev, dixin bin tirkan. Hemiyan kurmancî ji bîra kirine.»
«Na lo! Niha tu bi qedrê Xwedêkî, ew porsipiyên nola min û te bi tirkî dipeyivin, îcar?»
«Tew tew, bavo tu di guhê gê de yî. Di malên wan de kurmancî qedexe ye. Û bi ser de jî gava kurmancekî dibînin, sedek erd jê dûr direvin.»
«Kalo bes e bes, tu ê min dîn bikî!»
«Erê erê, hema hema hemû jî ji wê Tinata ku bavên wan bi Elîkê Betê re, bi qûncilikên eskeran re şer kiribûn.»
Durê sist kir, lê nimandî jî peyivî:
«Çêkiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro. Ew pê pîs dibin.» Dû re jî, «ma tu dibêjî, xortên me ên li nav gawiran jî, wê bi vê sefaleta me ranebin?» got û bi herdu destan zendê Nesîmayê firkand.
«Weh çawa! Mêrikan nikarin xwe bidebirînin. Ketine tolaqa jinan.»
Piştî ku bêhnekê ponijî, dengê xwe hilda û got:
«Howeh li vê ecêbê, di xetera mirinê de jî hin adetên civata me dihêlin ku mirov ji ber xwe fedî bike û bi xwe de nemîze. Keçên me li wan welatan ev adet hemû ji bîr kirine û nav şeqên xwe, li himberî mêrên xwe, mîna şûr û mertalan bi kar tînin, kuro!»
«Kalo, tu bi qedirê Xwedêkî, îcar niha bi rastî zarokên
202
me li wan welatan, bin qûna zarok marokan paqij dikin?»

«Keçê heta bi laşê porkurên xwe jî dişon!»
«Bila nekin, min xwelî li serê wan kira, ma ne zilam in!»
«Nekin, wê jin jî dev ji wan berdin û bigihên ên wek xwe.»
«Naxwe Seydoyê me jî li ser van tiştan a xwe berda, tu dibêjî?»
«Qenc û xweş kir, eferim jê re, ez çavên wî bixwim.
Ew lawik li min çûye. Li wan welatan du zilam ji me derketin, Seydo û Aydino. Sîno jî baş bû, lê xwe bi jinikê re pîs kir.»
«Çawa xwe pîs kir?»
«Keçê bernade! Mêrik bûye berdestkê wê...»
Circîs li ser xire cira ku li Swêdê di nav jin û mêrên malbata wî de derdiket, çend carekî bi telefonê bi Seydo re peyivîbû. Ji Seydo bawer dikir. Li gora wî, Seydo bi qilafetê xwe ê girs tam bûblanî bû. Û bi ser de jî ji exlaqê wî pir hez dikir. Bi çavên Şêx Hadî lê dinerî. Ji xwe pirê caran, di civatê de ew wilo bi nav dikir û li ser dipeyivî.
«... Lawo Seydo, ma hûn li jinên xwe dixin?»
«Na Kalo.»
«Eferim berxê min! Insanê ku mirov karibe pê divê mirov lê nexe. Ev karê eskeran e.
Lawo ma hûn xeberan ji wan re didin?»
«Na Kalo.»
«Eferim! Xeber ne karê lawên camêra ye.
Lawo ma hûn tolaziyan filan dikin?»
«Na Kalo. Ji roja ku ez zewicîme, doxîna min ji wê pê

ve li tu jinê venebûye.»
203
«Eferim! Li dor namûsa xelkê negerin. Gava mirov
xwe da ber dîwarê xelkê, wê xelk jî xwe bidin ber dîwarê
mirov.
Lawo ma hûn bi ser wan de pitpitê dikin?»
«Na Kalo.»
«Eferim, pitpitokî bi mêran nakeve; ew karekî pîrekî
ye, pîrekî.
Lawo ma hûn wan birçî û tazî dihêlin?»
«Na Kalo.»
«Eferim! Mêrên mêr, ji devê xwe dikin dixin devê jinê;
li xwe nakin li wê dikin. Jin namûsa mêr e. Bi her haweyî
divê mirov lê miqate be.
Kuro niha bi rastî hûn van tiştên ku min ji te pirsîn,
hemiyan bi cih tînin?»
«Ji van tiştan pirtir û pirtir jî em bi cih tînin.»
«Îcar lawo heger piçek xwîna min di we de geriyabe û
bi qasî misqalekî namûs bi we re mabe, hûn ê wan berdin.
Ez ji te re dibêjim zû a xwe berde!»
«Min berda Kalo.»
«Eferim lawê min», gotibû û ji wê rojê û pê ve li pişt
mêrên li Swêdê sekinîbû.
Durê gotin bir ser kuştina Aydin:
«Îcar bi rastî Aydino xwe li ser wilo kuştibû, Kalo?»
«Erê lawê bavê min Aydino, te bi kurmancî ji wan re
kitêb nenivîsandibana, waweyzê! Em miletekî xerabe ne.
Ma em ên ku kitêban bixwînin. Em û ilim û jîr û zanayî!»

Mêrik di wesyetê xwe de ‘ji ber ku kurmanc kitêban naxwînin, ez xwe dikujim’ nivîsandibû. Ma ne Seydo di telefonê de wilo ji te re jî gotibû.»

Durê destê xwe li kaba xwe xist:

204

«Mala min ê, termkê wî jî li wan dera ma. Wî lawikî jî tu tahm ji ciwaniya xwe ne kir. Ji wextê ku bîr bir bi deriyan ket, çû û çû û nema li gundikê xwe vegeriya. Hemû jî li ser van kurmancan.»

Circîs serê xwe hejand:

«Erê, li ser van kurmancan. Doza kurmancan ne karekî henek meneka ye, Pîrêêê, ev dozeke wilo ye ku te divê bibe dostê wê, te divê bibe dijminê wê, xêr nake. Mala dostê xwe û dijminê xwe herduyan jî xerab dike.»

«Baş e, naxwe ev çima tiştek bi serê vî Reyisko nayê? Hema hemû tişt bi serê me...»

«Wê bê û wê pir pîs jî bê! »

Durê û Circîs heta ku ro çû ber ava û qemyon ji bo şîva karwên sekinî, bi vî haweyî peyivîn û li rêyên ziktêrkirina kufletê xwe geriyan. Lê çi rêyên ku dan ser bi kaş û kelem derketin pêşiya wan. Deriyek nema ku lê ne xistin û deriyek jî li ber wan venebû. Di dawiyê de bi xemgîniyeke mezin hêviya xwe bi Yastar Elo û Seydo ve girêdan. Lê sîxurên Reyis jî, bi dostayî neh-deh meh berê li Stenbolê Yastar Elo girtibûn û ew di ser Yûnanê re derbasî Sûriyê kiribûn.

8

Şîv bi dilê wan bû. Girara ku Nesîmayê bi agirê daran

çêkiribû, têr rûn û bi şihîre bû. Ji tehma wê mirov têr ne dibû. Zarokan di binê beroşê û tepsikan de bang da bûn. Lê dîsa jî di qirika Circîs re ne diçû xwarê. Xwe di nava behrê û Izmîrê jî diriyekî di nava wê behrê de didît. Bi qasî ku çûbûn, dirî jî ewqasî ber bi wan de hatibû û bêlam û
205
cîm wê xwe bi wî diriyî bigirtana. Bi tepsikeke girar ji hemiyan dûr çûbû, pişta xwe dabû wan û bi dengekî nizm bi xwe re ketibû devjengê:
«Min çi kir ku ev ecêba pîs bi serê min û kufletkê min de hat? Qey ji ber ku min di her tiştî de bi a xwe kir. Na na, ez bi her kesî dişêwirîm û min li her kesî guhdarî dikir. Lê di dawiyê de te wek xwe dikir. Ê ev baş bû. Min mezinahiya axayê omeriyan di ber ku em ji welatkê xwe neqeliqin qebûl kir û min her tiştê xwe dayê. Lê mêrik xerabe bû. Ji ber xwe fedî dikir. Belkî jî wek wî bû», got û dîsa da aqilê xwe.
Heger di wan deman de min jî mîna wî bar kiribûya, helbet ev kambaxiya niha bi serê min ne dihat. Min pêşiya xwe ne didît. Ma wî didît? Min baş ne kir. Lê wî jî baş ne kir. Dev ji her tiştî berda û li xelasiya xwe û zarokên xwe geriya.
Xwe aciz kir:
«Yanî çi? Ez çi dibêjim? Ez mam, ez bûm kurmanc û ew reviya ew bû tirk, ha! Na na, ew jî ne wilo ye. A min ne ji bo doza kurmanciyê bû, min cesaret ne dikir ku ez bi vê êla xwe a giran bi xerîbiyê ketibama. Wî bi aqilî kir, wî wî», sêniya girara xwe bi wî alî de rijand û bi tepan bi nav

serê xwe ket.
Mencenîq lê temaşe dikir. Xwe lê girt û ji dûr peyivî:
«Apê Circîs, me pişta rêya xwe şikenand, ha. Heger bi
rê de tu bele li me neqewimin û bi vî haweyî em herin,
sibehê piştî nîvro em li qonaxa xwe ne.»
Circîs mîna ku sûcek kiribe, bi lez û bez rabû ser xwe
û ber pê de çû:
«Erê, heger tu bele li me neqewimin. Lê bi rê de neqe-
206
wimin jî wê li wir biqewimin. Me singê golik rakiriye, me
beroşa şîr rijandiye, me eshabe şelihandine, eshabe!»
«Apo bêhna xwe fireh bike, hûn ê li wir piştî demeke
kurt ji gundê xwe jî çêtir bijîn. Hîn berî ku ez ji Nisêbînê
bi rê kevim, ez bi telefonê bi çend kurmancên dilsoz re
peyivîbûm ku cihekî ji we re hazir bikin. Hazir kirine.»
Çeng bû:
«Cihê çi?» got û çik sekinî.
«Heta çend rojekî hûn ê li malên wan bin û dû re jî derbasî
xaniyên bê kirê bibin. Lê piştî demekê êdî hûn bi xwe
divê çareyekê ji xwe re bibînin.»
«Niha ev tu rast dibêjî?»
«Erê apo, erê erê. Ma qey tu bi biraziyê xwe bawer
nakî?»
«Kurmancên îro û alîkarî, ha! Û bi ser de jî li nav tirkan.
Dawiya dinyayê hatiye! Ma tu wan kurmancan baş
nas dikî?»
«Çend kes ji wan merivên min in. Insan in ji haziran
zêde nakin. Misixur in. Têra xwe baş in. Gava mirov li

wan diqeside, kêmaniyê naxênê. Tiştê ku ji destên wan tê dikin. Min çend malên din jî mîna we biribûn wir...»
Karwên haziriya xwe û çûnê dikir. Hesûk jî li dera han li bendî ku bavê wî û Mencenîq dawiyê li wensa xwe bînin, li ser pêyan sekinîbû.
«Yabo, de ka were û şîretekê li vî Cidhanê me bike. Mêrik bi qepera şûşe girtiye û ha ha vedixwe...»
Circîs destê xwe hejand û keniya. Di kenê wî re dida der ku tu xerabiyê di dilê wî de xuyanî ne dikir.
«Ji xwe ev ji me kêm mabû. Tam wextê wê ye. Lê lawo dev jê berdin, ew mirovekî ku ker jê nakule», got û xwe lê
207
girt.
Piştî ku li cem rûnişt û ziq li ser dev û ruyê wî nerî, dilê wî pê şewitî û destê xwe di ser serê wî re bir; şûşe ji nav şeqên wî derxist û da dest:
«Vexwe lawê min vexwe, da tu van qebhetên ku bi serê me de hatine ji bîr bikî. Lawo xwezîka min jî mîna te karîba vexwara û dû re jî sîlehê herî mezin di vê namûsa hindurê serê xwe de biteqanda.»
Cidhanê ku ji bo serxweş biketa vedixwar û serxweş ne diket, şûşe avêt.
«Yabo, tu mirovekî mezin î, bibexişîne», got, ket bin çengê wî û ber bi qemyonê de meşiyan.
9
Qemyon di a din î rojê de bi esirkî re li qonaxa xwe a dawî sekinî. Şifêr bi hêrs daket, wilo lezand, wilo deriyê qeresêleyê vekir û wilo jî peyivî:

«Apê Circîs, kuflet daxîne; çeqmaqê xwe jî pêxe û li
rewşa namûs û şerefa me kurmancan binere!...»
«Ez te fêhm dikim lawê min. Hêdî hêdî bêhna xwe
fireh bike», got û xwe berda jêr.
Vir Ozgurluk Koyu bû. Gundekî ku ji dûr ve mîna cihê
çoprêja bajarê Diyarbekirê, ji nêzîk ve mîna sûka kurtankerên
Mêrdînê xuyanî dikir. Lê gava mirov diket nav,
gund dibû tiştekî din. Mirov xwe li tara qehbik û qewadên
Şamê û Enqerê hîs dikir. Çar hawêr dengê tirkî, muzîka
arabeskan, teblikê, derboqa, tembûrê û qîje wîja pîrekan
dihat. Distiran, direqisîn û xwe çarpîne li erdê dixistin;
difîkandin, dikeniyan, digiriyan û diqêriyan. Û di nav vê
208
qîr û qiyametê de jî çar melan, her yekî li aliyekî bi hev re
bang didan. Hinekan tew qesîde jî digotin. Doşek, lihêf û
kincên debixî hawêrdor bi dîwaran ve daliqyayî bûn.
Mirovên bi qerewat û fotêr, bi kincên paqij û qilêrî, nuh û
pînekirî, şerwal û pantor, bi çefî, şifqe û çakêt, xortên tena
derpî û mayo, keç û jinên sertazî û bi bêceme wek gêrikê
diçûn û dihatin. Belengazî û feqîrî û fiqrî û pîsî ji her derê
gund diherikî.
Karwan bi tirs daket. Lê çawa daket wilo jî bi tirs di
cihê xwe de sekinî û serê xwe berda ber xwe. Circîsê ku
devê wî gihabû pişt guhên wî jî, tev ne qeliqî. Zarok bi keç
û dayikan ve bûn dirdirk, lerizîn, giriyan û bêmefer xwe
avêtin bin fîstanên wan.
Mencenîq piştî ku problema wan a herî mezin fêhm kir,
xwe bi zor beşişand:

«Zarokino netirsin, bi tirkî dipeyivin lê hemû jî mîna me kurmanc in. Ji hêla me ne.»
Lê piştî ku hin keç û jin jî ji rewşê hebitîn, xwe cidî kir û domand:
«Nisêbîniyên me jî di nav wan de hene. Omerî, torî û botî hemû li vir in. Û çend malên stilîliyan jî. De ka bisekinin, hûn ê bibînin hema ji niha û bêhnikeke din, bê wê çawa stilîlî li me vehewin û bi qerfan rahijin me...»
Ew hîn wilo dipeyivî, Circîs mîna dînan li wê navê çû û hat û bi kulman raserî sênga xwe hat:
«Haho, haho! Wey li me xwêniyê destê tirko! Îcar em ê çawa bikin, Xwedêyooo! Tirkoyê ku him zinê û him qetil bi me re kir, em bi deriyan xistin û em avêtin sikakan!...
»
Pîrekî di tayê wî de ji nav koma ku mirov digot qey li
209
sînemê dinerîn, bi lez hat cem û bi dizî di guhê wî de peyivî:
«Ez xulam, bi xwe karibe û gotinan neteriqîne. Vir tije polîsên xefî ne, wê we bigirin. Ne bi tenê mala te xerab bûye, eynî tişt bi serê me van ên vir hemiyan de jî hatiye. Ez jî li hêla Torê axayê eşîreke mezin bûm...»
Circîs hişk bi sênga wî girt û hejand. Dû re jî «Torê ha!» got û ew heliqand.
Lê ew jî pê re ket û li erdê veziliya. Wî xwe ne kir wek wî. Berî Circîs xwe da ser hev û di kêlekê de rûnişt.
«Halo xuyaye ku toriyên me zikê te jî mîna ê min êşandine.
»
«Kuro ma êşandin û hew, çirandin çirandin!» got, rabû

ser xwe û vê carê jî berê xwe da komê:
«Ha werin sînema belaş, sînema qu...ê jina tirkooo!
Werin, werin!...»
Kom bi ser de hat. Her yekî ji aliyê xwe ve rahişt alavekî
wan û dan dû Mencenîq. Lê xortekî ji komê piştî ku
ji Circîs re got «heval, xeberan ji turk halqî re nede», Circîs
bi carekê ve ji ser xwe çû:
«Weyla, weyla li vir jî hene kuro!» Herdu destên xwe
bi ser de hejandin, «kuro lawo, gû ji fiqrê te dibare! De ka
pêşî here xwe ji vî gûyî paqij bike û dû re li ser tirkên xwe
bi min re bixeyide...»
«Heval ya tu dîn î û yan jî tu antî devrîmcî yî. Heval ev
navê te çî ye?»
«Navê min Kurmanc Qaçtî ye. Qaçtî, namûsiz ewladî,
Qaçtî!» got û xwe çeng kir kevirekî ku têwerke.
Mencenîq pê ve bazda û li bayê beza xwe şiqamek bi
xorto ve zeliqand. Lê bi wê jî bi tenê nema. Ew da ber
210
dahfan, ji bo pevçûnê çavê xwe li ser qelebalixê gerand û
xeber ji esker, polîs û temaman re da. Ji koçberan kesî
dengê xwe ne kir. Xeberên wî li hesabê her kesî dihat.
Xeberên Circîs jî. Piştî ku çi got û jê re ma, xorto mîna
tepiskekê pengizand nav qelebalixê û bi gotinên herî xweş
li ber dilê Circîs çû û hat. Circîs jî li ser pêyan, serê xwe
xist ber xwe û lê guhdarî kir.
Çiqasî bi wir de çû, koçber bi hatina ku maleke din li
wan zêde bûye agahdar bûn û pêl bi pêl hatin. Hema hema
hemû jî destdagirtî bûn. Di destê hinekan de nanê tenûrê û

nanê sêlê, sêniyên girar û birincê, galon, tas û sûlahiyên
avê û di destên hinekan de jî cil û alavên malê hebûn.
Pîrek li pîrekan, zilam li zilaman vehewiyan û bi rengekî
kurdî xêrhatin di wan dan. Niha kêfa Circîs lêbû. Bûyera
bêhnek berê ji bîr kiribû û bi kurmanciya xwe tevdigeriya.
Mîna şêxekî serhanî sekinîbû û herwiha destê wî li hewa
bû. Lê wî ne bi haweyê şêxan, mîna axan û maqûlên kurdan
dualî ruyê wan maçî dikir. Ji xortan re digot «eferim
lawê min», ji zilaman re «...bila serê we sax be» û ji kalemêrên
ji xwe piçûktir û mezintir re jî digot «...ez xulamê
we me.» Her tişt hata ku pîra serhedî ne hat jî baş çû. Lê
çi qewimî hemû di vê bêhnikê de qewimî. Pîrê çengek
savar xistibû taseke naylonî, li ber Durê rawestiyabû û bi
kel û girî jê re digot:
«Bila mala tirko xerab bibe, xweha min ev ji min qediya.
Li min porkurê, ez ji mala xwe nikarim zarokekî bi nan
bikim; di nav wan bedilên livînên serhedî de razînim û
birînkên wî derman bikim, wey li min pepûkê xwehê!...»
Bi dengê wê re Circîs xwe nema li tena girt, di cihê
xwe de rûnişt û wek wê giriya...
211
Li vî Ozgurluk Koyu ji bilî holikan, kon û çadirên ji
pîneyan, gelek xanî jî hebûn. Xanî bi hişkeberê lêbûbûn û
ser wan bi dep û daran, şax û perên çaman, tenekeyan û
axê hatibûn nixumandin. Xaniyên ku hîn xirbe bûn û ser
wan naylon kirîbûn jî pir bûn. Gund têra xwe mezin dihat.
Di guhereke fireh û qûna çiyê de ava bûbû. Guher malê
metrûkê bû. Li dora du sed û pêncî malbatekî lê bi cih

bûbûn. Gundekî kurdistanî bû. Hema hema ji her derê welêt insan lê civiyabûn. Li derdora vî gundî çend gundên din wilo mezin hebûn. Hemû jî bê elektirîk û bê av bûn. Lê koçberan bi çend çal û bîrên ku kolabûn, bargiraniya xwe a avê hinekî sivik kiribûn. Doganlar Koyu jê û tibabekî bi wir de li aliyê rohilat diket. Bi bexçe û avaniyên xwe, mîna havîngehên siltanan xuyan dikir. Ozgurluk Koyu bi Izmîrê vebû. Bi terempêlên polîsan, nîv seetek rê digirt, ewqas.

Heriştî ne wek ku Mencenîq gotibû encam dabû. Dostên wî ên ku li gundê Doganlar rûdiniştin, ji karwanê wî re li gundê Ozgurluk bi vegirtina sê konan û çend beroş xwarin, alîkariya xwe bi dawî anîbûn. Ew yeka han bi Mencenîq pir zor hatibû. Ji Circîs re xweş kiribû û li himberî wî derewîn derketibû. Pir li ber xwe diket. Lê Circîsê ku ew wek camêrekî mezin qebûl kiribû, wek wî ne difikirî. Dilê wî xweş dikir û li ber digeriya:

«Lawê min, ji bo me tiştê ku ji destê te hat te kir. Heger kêmaniyek bûbe jî ew ne sûcê te ye. Ji destên wan camêran belkî ewqas dihat. Dîsa jî mala wan ava be. Alîkariyeke mezin bi me re kirin!...»

Hewr mîna gwêşiyên tirî bi ezmanê Izmîrê vebûn. Şînê girtibû bin konan. Dinya baş tarî bûbû û Mencenîq jî hazi-

212

riya çûna xwe dikir. Lê Circîs û maliyên xwe jî pê ve bûbûn benişt. Hemiyan jê hez kiribû û bi çavên yekî ji xwe lê dinerîn.

«Mirovê gava ku bi mal û can li ber bayê mirov rabû,

dibe yekî ji malê», Circîs got û bi destê xwe li kaba wî
xist.
«Ez mecbûrê çûnê me apo, zarok hûr in û di mitala min
de ne. Karê min heta vir bû. Lê ruyê min reş be, min karê
xwe baş bi rê ve ne bir û ez li himberî we fedîkar derketim.
Min bibexişînin.»
«Wilo nepeyive ez aciz dibim. Lawo, te her tişt bi ser
ve bir. Heger kurmanc hemû fena te bana, ji zû de em û tirkan
em ê ji hev xelas bûbana. Îcar bi a min bike û îşev jî
mêhfanê me be.»
«Nabe.»
«Şev e. Û şev jî bi qede û bele ne, bi a min bike û
bimîne.»
«Ji bo şifêrekî nola min, şev ji rojê çêtir e. Destûrê bide
da li min derengtir nebe.»
«Zarokan hilfa xwe avêtine ser te; ji bo zarokan
bimîne.»
«Ez ê di wextekî nêzîk de seriyekî li zarokan bidim...»
Gotin di serê Mencenîq de ne diçû. Wan çi got, wî jî
singek pê vekir.
«Baş e», Circîs got û hemû pê re rabûn.
Pê bi pê meşiyan û peyv bi peyv rast xwe li qemyonê
girtin. Mencenîq sekinî. Ên din jî sekinîn. Dîsa meşiyan,
dîsa sekinîn. Lê ev fesla dawî bû. Pêşî xatir ji zilam û xortan
û dû re jî ji keç û jinan xwest. Çû destê Durê. Durê jî
hat ruyê wî. Niha dora Circîs bû. Ket bin çengê wî. Ji
213
komê dûr çûn, ji dil beşişî û got:

«Apê Circîs.»
«Bêje birazî.»
Hema ne got, hişt ku tîr bibe. Bi destê wî girt û rûnişt.
Circîs li ser pêyan ma. Bi vê rûniştinê bûn bi qasî hev.
Mencenîq serê xwe berda ber xwe, rakir û danî û dîsa rakir
û got:
«Apo, ma ne ez jî torî me.»
«Na lo!» got û ziq li herdu çavên wî nerî.
Dû re jî ruyê wî maçî kir û gotina dawî jê re got:
«Ji toriyên zana, camêrên wek te derdikevin. Eferim
lawê min. Tu bi xêr û selamet biçî.»
Mencenîq jî piştî ku sê-çar caran li ser hev destê wî
maçî kir, ji nişkê ve taxek pere xist bêrîka wî û bi bazdan
çû.
214
BEŞÊ DEHAN
1
«Firsetên civakî her tim bi dest mirov nakevin, lê ên
şexsî her tim hene. Û me kurmancan jî ji wextê telebeyan
û vir ve, ew firseta civakî bi dest xistibû. Bi hezaran zarokên
kurmancan xwendegehên bilind xelas kiribûn û bi deh
hezaran jî dixwendin. Jîr û zanayî ketibû nav milet û insanên
me li ser doza xwe hêdî bi hêdî li hev dibaniyan. Xelk
halxweş bûbû. Di dawiyê de kurmancan xwe dan ser hev
û li pişt Reyis sekinîn. Ew ji bo me firseteke civakî bû,
ezbenî. Mêrik ne ji me bû, mêrik xayin bû. Him ew firseta
me a civakî ji dest me kurmancan revand û him jî em
pîs perçiqandin! Heta bi urf û adetan û zimanê me têk

birin! Vî mexlûqî tiştekî halo bi serê me de anî ku em ê tu carî nikaribin bi ser xwe ve bên!»
Bêhna Circîs teng bû:
«Dev jê berde. Baştir e ku em teybka xwe vekin û ji xwe re li strankên xwe guhdarî bikin...»
Herduyan di taldeya kon de xwe dabûn ber rokê. Fermanê torî, gotin ne kir dudu. Serê xwe hejand û hema di cih de teyb vekir. Pişt re jî dengê wê tibabekî nizm kir. Fermên şerê mala Nêsir digot. Karê wan ev bû. Dengê wî ne ewqasî xweş bû. Di civata mîr û mîrek û axan de, rê ne didan wî dengî. Lê ewqasî jî ne xerab bû. Bi Circîs pir xweş dihat. Ji dil û can guh dida ser û pê re ditewirand. Fermên ji şeran, pênc-şeş kasetên nod metreyî dagirtibûn. Herdu jî ne dengbêj bûn. Lê ji dengbêjan bêhtir jî ji stranên kurdî hez dikirin. Heta ku Circîs ne hatibû vir jî,
215
Fermên bi tenê li dengê xwe guhdarî kiribû. Hîn ji dema ku partiyê muzîka kurdî qedexe kiribû, bi vê yeka han rabûbû. Lê piştî ku hatibû vir û ji koçberekî tertoqeke teyban bi çend sed hezarekî kirîbû, xwe berdabû sûka Izmîrê û li kasetên kurdî geriyabû. Çend kaset peyde kiribûn. Lê hema di cih de jî şikenandibûn. Li gora wî, ne dengê dengbêj û ne jî meqamê muzîkê kurdî bû. Lê niha êdî nema xema wan bû. Ew problem safî bûbû. Herduyan jî dinyayek kelamên kurdî dizanîbûn. Stranên xwe xistibûn teybê û bi dorê li dengê xwe guhdarî dikirin. Ew jî gava ku dihatin cem hev. Lê li malê, li ên hev guhdarî dikirin.
«Pars, pars!.. Yalla, yalla!...»

Circîs çeng bû, bi lez teyb girt û xaşomaşî li derdora
xwe nerî.
«Çi bû ezbenî?»
«Ev çi deng e?»
«Haaa, pars.»
«Parsss!»
«Hohoo, tu ê niha çi bibînî û çi nebînî! Bavo xwezîka
hema bi parsê tenê ba. Em pê qayil bûn.»
Sênga xwe gihand sênga wî û ji jêr de li herdu çavên
wî nerî. Çavan rastî jê re digot. Bawer kir.
«Ev xelkê vir bi parsê xwe didebirîne, yanî?»
«Xwezîka karîba xwe pê bidebiranda. Ew jî bi dest
nakeve, heyra.»
«Ev tu çi dibêjî, ez fêhm nakim, ezbenî?»
«Erê ma ne ji xwe, li ber deriyê her mizgefteke Izmîrê,
sê-çar kes rûniştîne. Ma wê alem bide kê û nede kê. Bêrîka
wan xizne be jî têra me nake.»
Wî ne bi vî rengî fêhm kiribû. Lerizî, xwe bi ser hev de
216
guvaşt û bi hêdîka got:
«Yanî hûn destê xwe li ber alemê vedikin, tu vê
dibêjî?»
«Bavo em paçik jî li erdê vedigrin.»
Keliya û bêhemdî xwe nexweş peyivî:
«Ma qey hûn ji xwe fedî nakin? Namûs û şerefa we
tune!»
«Me ew şeref û namûsa ku tu zanî, ji zûûû de bi nav
lingan de berdaye, hevalo. De ka bêhna xwe fireh bike,

heqê te heye, tu hîn nuh î. Bi min jî halo ecêb hatibû.»
Circîs piştî ku fêhm kir bê çiqasî kûr dibêje, sist bû.
Hinekî jî bi gotina berî niha li ber xwe ketibû. Keysa xwe
li rûniştinê xweş kir û wek feqeyê ku pirs ji seydayê xwe
dikir, jê pirsî:
«Ma qey karekî ku ev xelk ji xwe re bike tuneye?»
«Na.»
«Kar tuneye, yan ew tune ne?»
«Kar nadin me.»
«Çima?»
«Ji bo ku em baş rezîl bibin.»
«Ma ji vê rezîliyê bêhtir!»
«Na, hîn heye. Dixwazin bi rengekî iloezî qira me
bînin.»
«Ê anîn. Em ji welatê me celî kirin. Ma ev ne qirkirin
be naxwe çî ye? Ma ji vê mezintir!»
«Circîs!»
«Libê.»
«Libê şêrîn, dengê min bibe xwe. Esker û tîmên ku bi
gundên me re, temamê welatê me wêran kirin, aha ji vê
herêmê bûn. Ên ku di nav bax û bexçeyên me de goştê kar
217
û berxên me dixwarin, li ser çem û kaniyên me araq vedixwarin
û di hindurê helîkopteran de paqên keçên me hildidan
û diketin ser zikê wan, ji vir bûn. Ji vir li ber şêrên
daristanên me, pilingên zozanan û bazên ezmanê me vediteqilîn,
dikuştin û laşê wan ji wawîkan re berdidan. Çemên
me ên ziwakirî herikîne vir, dohn û qeymaxê bihara me li

vir bi kar tên. Serê zîhayên marên ku di çaviyên kaniyên me de bûne gilofîk, di binê vî bajarî de ne, looo! Bihara me bi agirê febrîqeyên vî bajarî re dişewite, lolo bira! Û tu jî li vî bajarî li rehma insaniyetê digerî! Ji ber ku me di karan de bixebitînîn, berê me ne dane vê hêsîriyê.»
«Ezbenî wilo ye, wilo ye, lê ji bo xwe mabe dîsa jî divê karekî bidin vî xelkî.»
«Kar nadin me.»
«Sebeb çî ye?»
«Sebeb, em ne ji wan in, weh!»
«Ê va ye îro em ji wan in, em li welatê wan dijîn.»
«Ew wek te nafikirin.»
«Divê bifikirin. Gava nefikirin wê ji wan re jî xerab bizîvire.»
«Nazîvire.»
«Çima?»
«Ji ber ku em kurmanc ne tiştek in. Em gurê serê xwe ne. Em edûqewm in, em bêtifaq in, em berî berdayî ne!»
«Ma li vir jî?»
«Erê erê, em li vir jî ne bi hev re ne.»
«Ecêb e!»
Xwe aciz kir, «erê em ecêb in», got û destê xwe avêt bêrîka şerwêl.
Bi lez qutiya çixareyan vekir û çixareyek pêçayî xist
218
nav lêvên xwe. Lê hema pê re jî mîna ku qebhetek kiribe, çixare avêt û qutî ber bi dostê xwe de dirêj kir:
«Stexfurlah, bibexişîne, min ji bîra kir!»

«Tu û lawê xwe sax bin, ez çixareyê nakişînim», got û hat ser mijara berê.
«Rast e, gava tifaqî tune be, dijmin mirov bi tiştekî hesab nake.»
«Me kurmancên di nav xwe de wek pîrekan û ên li welêt jî wek zilaman dibînin. Ma te zanîbû ku li vir kurmancî serbest e?»
«Serbest e çawa?»
«Yaaa, te nizanîbû. Mirov bi rehetî kare li ba polîsan û tirkê herî bêbav bi kurmancî bipeyive. Û heta li temamê dayirên dewletê jî. Li welêt ji me re digotin 'hûn tirk in' û li vir jî ji me re dibêjin 'temam tişt nabe hûn kurd.' Li welêt kurmancî qedexe bû û li vir jî serbest e.»
Ev jî ji bo Circîs tiştekî nuh bû.
«Wilo çilo ye», got û li koma kalemêr, pîrejin û zarokên seqet ku li ber dolmîşan rawestiyabûn temaşe kir.
Ferman destê xwe ber bi wan de rada:
«Aha ew hemû ên ku wê biçin li parsê bigerin.»
«Çiii!» got û bi herdu destan serê xwe heciqand.
Fermên ajot ser û lê hîn bêhtir şidand:
«Binere binere, ew dolmîşa pêşî a pîrekan e; pîrekên ku li ber deriyan li kurtêlan digerin. A duduyan, ewa sor sor, kalên mîna min û te li ber mizgeftan datîne. Ewa gewr, xort û zarokên ku li welêt bi bombeyan seqet mane, li sûkên bajêr belav dike. Û ewa din jî ji bo zarokên ku ji halê fêkiyê xerabe didin hev, sekiniye.»
Circîs bi wî haweyî piştî ku bê his û pis qederekî seki-

nî, li kaba xwe xist:
«Min ê ev yek jî bidîta, ha!»
Ferman serê xwe berda ber xwe û hejand:
«Ev hîn ne tiştek e, tiştên ji van mezintir hene. Erê, pars eyb e. Lê ne bênamûsî û gunehkarî ye. Bêhna xwe fireh bike bê tu ê niha...»
Circîs bi hêrs got:
«Ez ê hîn çi bibînim ez xulam! Ji van mezintir mirov jina xwe difroşe; qewadî û qûnekiyê dike.»
«Ez xulam, ne ji bo ku ez te aciz bikim ez bi te re halo dipeyivim.»
«Ez dizanim ku tu ji qenciya xwe dibêjî. Barê min giran e.»
«Lê ne bi qasî ê min. Erêêê, erê birayê min. Lê ev jî halo ye, dema ku xelekên jiyanê ji hev qetiyan, êdî pir zor e ku mirov karibe wan xelekan mîna berê pev girêbide», got û hêsîr gindirandin.
Fermanê ku xwe bi Circîs wek axayekî toriyan dabû naskirin û Circîs jî ew dahf dabû, bi Circîs re bûbû dost û xwe ji civata wî qut ne dikir. Di hikmê du-sê rojan de hevdu baş nas kiribûn û gelek tişt ji hev re gotibûn. Ferman bi pênc-şeş salekî ji Circîs piçûktir bû, lê jê pîrtir xuyan dikir. Bejna wî a dirêj di rûniştina wî de jî lê bûbû bar. Bê talde nikarîbû rûnişta. Bi qeweta gopêl dimeşiya. Berçavk bi kar dianî. Li vir gava dest bi parsê kiribû rîha xwe berdabû. Li gund çefiyeke belek û li ber deriyê mizgeftan jî kum dida serê xwe. Zarê wî hinekî dişibiya ê Heso. Lê bi qasî wî ne devliken bû.

Fermên axatî ne kiribû; axatiya xwe ji pismamên xwe
re berdabû. Ew jî mîna Circîs xwediyê milk û emlakan,
220
terempêl û terektoran bû. Malbata wî baş mezin bû. Mêrê
du jinan û bavê nozdeh keç û lawan bû. Tarîxa pevçûn û
liberxwedana wî û malbata wî hema hema wek a Circîs û
malbata wî derbas bûbû. Wan jî bi mal û can xwe dabûn
pişt çekdaran; kuştibûn, hatibûn kuştin û bi çiyan ketibûn.
Bi kurtî, piştî ku tam ji per û bask ketibûn, nav wan û çekdaran
vebûbû; hevdu bêminet kiribûn û navê wan bi cahşitî
ketibû deftera partiyê. Çekdaran çend carekî êrîş biribûn
ser gundên wan û li hev girêdabûn. Ji herdu hêlan jî gelek
kes hatibûn kuştin. Lê piştî ku çekdaran herêm terk kiribûn,
vê carê jî êrîşa mezin eskeran digel pîberan biribûn
ser wan. Bi wê êrîşê re hin hatibûn kuştin, hin bûbûn pîber
û hin jî reviyabûn. Li dor bîst mehekî çêbûbû ku Ferman
bi bîst û çar kesên ji malbata xwe li vir bi cih bûbû. Di
malbatê de zilam ne mabûn. Ji herçar xortên wî, polîsan
dudu jê girtibûn û xistibûn girtîgehê û herduyên din jî bi
Stenbolê de terqiyabûn û bi carekê ve têkiliyên xwe ji
malê qut kiribûn. Çend keçên neviyên wî, li kolanên
Izmîrê bûbûn qehbik. Û wî jî li ber deriyê mizgeftan destê
xwe vedikir. Circîs bi van hemiyan ne hisiyabû.
«Dev ji girî berde. Ma tu dixwazî ez jî bigirîm? Heger
bi girî safî bûbûya, hetanî bi mirinê ez ê bigiriyama», got
û wî jî dest bi girî kir.
Bêyî ku bipeyivin serê xwe berdan ber xwe û qederekî
hêsir barandin.

«Ma gelo pars tu mifheke xwe li wan dike? Dikarin
xwe pê bidebirînin?»
«Li gora ku digotin, hetanî çar sal berê jî hinekî baş bû.
Lê di wextê min de dest», di cih de qulipand, «wextê ku
em hatin vir nema wek berê bû. Li gora ku hîn jî tê gotin,
221
di destpêka koçê de pîrek mal bi mal negeriyane û li deriyên
xelkê nexistine; xelkê bi xwe ji wan re aniye. Her
malê têkiliya xwe bi aşxaneyekê re daniye û xwarina ku
wê bihata rijandin ji xwe re anîne. Lê dû re her tişt bi carekê
ve tê guhertin û her kes deriyên xwe li ber wan digirin.
Ên me dîsa diçin. Diçin diçin, lê tif û lêdanê dixwin.»
«Belê niha jî diçin. Ma bi tif û lêdanê kurtêlan bi dest
dixin?»
«Carina ew jî heye. Kurtêlan û filan û bêvan ji bermîlên
çopê derdixînin. Na bavo, ma îro kes kare xwe tengî
maleke tirk bike! Baş e ku ev esker hene.»
Circîs çeng bû û bêhemdî xwe dengê xwe hilda:
«Wilo çilo ye! Başiya çi!»
«Xwarina herî pir ew dirijînin; kurtêlên herî mezin ew
diavêjin. Heta bi kincên nuh jî...»
Circîs piştî ku fêhm kir bê çi dibêje, bi hêdî got:
«Ma esker rê didin ku mirov herin nav wan?»
«Ma çima wê herin nav wan, çop û bermîlên xwarinê
dûrî hewşên wan in...»
«Lê dîsa jî heger zanibin ku kurmanc zikê xwe bi kurtêlkên
wan têr dikin, wê nehêlin.»
«Na na tu şaş î, ne wek ku tu dibêjî. Pê zanin. Li me

dinerin», bi xwe hisiya, çerx kir, «ên me kom bi kom diçin; esker ji xwe re li wan dinerin û ha ha bi wan dikenin. Lê bi rastî jî fêda kurmancên me ên ku di nav wan de eskeriyê dikin, baş digihê me.»

«Min fêhm ne kir?»

«Pirê caran ew bi xwe li ber bermîlên xwarinê dibin nahtor. Semûnên nên dikin kêş. Zêde zêde tînin. Hema Xwedê ji wan razî be.»

222

Circîs xwe aciz kir û çort got:

«Bênamûsan li welatê xwe çima wilo tevnagerin. Dev ji wan berde, ew jî kûçik in. Lê ez dixwazim tiştekî din bibêjim:

«Erê ji bo çi ev tirk ewqasî ji me kurmancan aciz in? Min serê xwe pir bi wê yeka han êşandiye û min tu mane ne dayêyê. Niha ku hebûna me bûba sebebê nebûna wan, ser çavan, lo. Wî çaxî çi di me de bikirana heqê wan bû. Lê ne wilo ye. Me tu carî dijminayî bi wan re ne kiriye. Ew her tim bûne dijminên me û em kuştine. Ez bawer nakim ku ev dexsa wan li ser maldariyekê filan be. Hema welatê me bi tenê têra me û wan û temamê dinyayê dike. Erê kuro, bi ser vî halî de em qîma xwe bi wan tînin û ew hîn jî qîma xwe bi me nayinin. Bê çi bêbav in, him jê vedixwin û him jî tê de dimîzin!»

Ferman beşişî:

«Ezbenî tu rast dibêjî, lê ew wek te nafikirin û li meseleyê nanerin. Li gora wan, hebûna me nebûna wan e. Îcar ji ber ku ew halo difikirin, xwe mecbûrî temamê xerabiyan

jî dibînin. Pêşî divê wek te bifikirin. Dema ku wek te fikirîn, wê welatê wan jî bi ê me re xweş bibe û em ê hemû di nava dewlemendiyê de bijîn. Ev tirk miletekî halo ne ku xerabiyê berî qenciyê difikirin. Xerabî ji xwe re kirine tebîhet. Serê wan piçûk e, piçûk.»
«Lê ê me ji ê wan jî piçûktir e.»
«Helbet, helbet, halo ye, ew tiştekî din e...»
Hesûk û Cidhan ji ser xirbê ku lêdikirin dihatin. Circîs xwe da ser hev, gotina Fermên birî û ji dûr ve bi wan re peyivî:
«Lawo, ma ji wî xirbekê me re hîn pir divê?»
223
Hesûk:
«Çend rojek.»
«Hûn pir giran dirin. Tu destsivik bû. Qey tu xwe lê naşidînî.»
«Ma çawa ez xwe lê naşidînim, xwêhdan di qûna min re diavêje. Em her kevirekî ji derekê tînin. Kevir jî xwezîka kevir bana, nikarokî, kirîzî û piçûk in. Hetanî ku em kevirekî qorzîbiran dibînin, çavê me û sed bavê me derdikeve.
»
«We dar û ber çawa kirin? Rewt, qesele, pûş peyde dibe?»
«Dar û ber ne hiştine. Qesele û pûşê çi, her der bûye çol. Ji bo ku mirov tayikekî yan gewdeyê dareke ketî peyde bike, divê mirov here heta ha ha bi wî çiyayî. Em pir diwestin.»
«Çima qey palûteyê dev ji we qeriya, hûn bi tenê ne?»

«Xwedê xêra wan qebûl bike, heger ne ji alîkariya wan bûya me ê nikarîba tiştek bikira», Cidhên got û destên xwe di ber xwe re berdan.
«Bila ew jî bi we re bihatana firavînê. Ma ne eyb e ku mirov xwarinê nede paleyên xwe?»
Hesûk beşişî:
«Yabo, ew li Zorava ma, Zorava. Ma tu dizanî ku hin ji vî gundî li luquntan ji sibehê hetanî êvarê bi beroşeke xwarin dixebitin? Ew jî bi berger. Karekî wilo bi dest her kesî nakeve, yabooo!»
Circîs li gotina xwe poşman bû.
«Lawo de hûn dizanin, hema a baş kîjan be wê bikin û hew.»
«Yabo a baş li vî welatî tune. ‘Meleko û bi lepê xwe
224
ve’ heye...»
Di vê navê re mela kebirand. Circîs rimekê bilind bû:
«Gelo pîr e, ciwan e, zarok e? Hema xwedê bikim pîr be. De ka lawo herin fêhm bikin.»
Li vî gundê ku navê xwe ji azadiyê girtibû û di nav sefaletê de soberî dikir, hema hema her hefte termek ji erdê radibû. Zarok di piraniyê de bûn. Jinan li vir pir ber diavêtin.
Hesûk piştî ku got «keçikek sê-çar salî bi sorikan miriye », çû bin kon û Cidhên jî di cih de ber bi dengê mela de bazda, Circîs gazî Hesûk kir:
«Ma çima xortên me ne hatin xwarinê?»
Hesûk nigdan vegeriya:

«Yabo, dîsa hersêyan dan dû hev û çûn bajêr.»
«Lawo bila bes herin bajêr, mêrikan bi kêrî karan nayên. Him mirovê ku xweşik bi tirkî nizanibe wê tirk çawa kar bidênê.»
«Yabo mesele ne ew e. Bila bi zimên nizanibin, kar bi temamê zimanan dizane. Tirk kar nadin kurmancên te. Divê tu wilo bizanibî. Tirkên ku nîvê kurmancên te li welêt qedandin û nîvê din jî kişandine nav xwe, li welêt ne hiştin ku em karekî ji xwe re bikin, îcar wê li vir kara bidin me, hi! Sûndayî ne, sûndayî! Hino hino me diqedînin. Hinan bi kuştinê, hinan bi girtinê, hinan bi terqandinê, hinan bi qewadî û qehbitiyê. Di devê me de dimîzin.»
Herdu destên xwe hejandin, «ha ji vî gundî, ji vî gundî, dinyayek keç û jin ketine rêyên xerab!»
Circîs gotina wî birî û bi wahc got:
«Lawo hûn min dikin dizê şekala min, wilo nabe. Tiştên ku min ji we re digot hûn ji min re dibêjî. Ma min
225
hindikî qirika xwe bi we re qelişand da em ji gundikê xwe dernekevin. Bi gotinê mû bi zimanê me ve şîn hat. Lê we bi a min ne kir...»
Durê li dengê wan derket.
«Bavo dengê we diçe xelkê, xelk bi me dikenin hêdî hêdî. Hîn qutê me ne qediyaye hûn vî tiştî di serê hev de dikin, îcar ku em li aziyê rûnin hûn ê çi nekin! Here û were bîst û neh rojkên me li vir çêbûne. Ka hinekî bêhna xwe fireh bikin, bê Xwedê çawa dike. Di bîst û neh rojan de du bîst û neh carî em pev çûne. Geh Saliho û Faro, geh Serhano

û herdu, geh Hesûk û Kalo, geh Kalo û em hemû. Ma
wilo dibe?»
«Dibe dibe», Circîs got û pê de çû:
«Keçê di pevçûnê de xêr û bereket heye. Ji wê roja ku
vî kufletî dev ji berberiyê û pevçûnê berda û min jî da dû
wan, yeka min ne bûye dudu. Rev ha, ma bi me diket! Em
ê him xwediyê mal û milkan bana û him jî em ê mîna
şêxan li mala xwe rûniştana, ha! De wilo bixwin, ha!»
Hesûk xwe zewirand:
«Berberî û pevçûn ser çavan, lê ma bi pîberayetiyê?
Bibe hevalê eskeran û kurdan bikuje. Ew ne karekî
camêran bû.»
«Waaa, kudko kudko, de ji xwe re li vî zir camêrî binerin.
Îcar niha tu camêriyê dikî, ha(!) Ehmeq lawê min
ehmeqî, divabû mirov li aliyekî cihê xwe bigirta. Ya em ê
ji dû Reyis venegeriyana û me ê kinêsa xwe vemiranda û
yan jî me ê bi eskeran re dostaya xwe xweş bikira û bênamûsiyek
ji eva niha siviktir heta demekê qebûl bikira.
Camêr e, hiii...!»
«Kalo, hema xwezî ez û tu em herdu ji xwe re miriba-
226
na û ji ezabê vê kafirstaniyê xelasbana», Durê got û çû bin
kon.
Circîs avêtê:
«Ji zarokên xwe re bibêje û hema aniha bila dîlekçeyekê
ji wî Xwedayê ku li sefaleta me û vî gundî dinere,
binivîsîne. Ma ez ew ê ku ji mirinê bitirsim!...»
Cidhan bi destê sê zarokên Sêlih girtibû, bi hev re digiriyan

û dihatin.
Hesûk keniya, destê xwe ber pê de vekir û ji Circîs re
got:
«Yabo, de ka bibêje bê Cidhanê te ji bo çi digirî?»
«Ma ez çi zanim lawo, qey li ser wê keçika mirî digirî.
»
«Na, te tê dernexist. Jê ne hatiye ku ji beqêl tiştekî ji
zarokan re bikire, giriyê wî ji ber wê yekê ye.»
Wilo bû. Zarok li ber dikana beqêl rûniştibûn û li ser
nepoxan giriyabûn. Cidhên xwe avêtibû beqêl û bi berger
û lavlavkê kiribû û ne kiribû balonek jê ne stendibû. Kevnekotkê
qutikê xwe ji xwe kiribû û dabûyê, lê beqal dîsa
ne hatibû rayê û bi ser de jî erza wî şikenandibû.
Cidhan rast çû bin kon. Circîs da dû û bi destê wî girt:
«Were lawê min were, ji te pere û here pêncî şikil
tahmtîtk ji zarokan re bikire», got û li qewlikê xwe ê peran
xebitî.
Ji sed û pêncî milyonê wan nod milyonek mabû. Ew jî
nêvî li cem wî û nêvî jî li cem Durê bû. Rahişt pêncî hezarî
û xist destê Cidhên.
Ferman keniya:
«Pêncî hezar heqê du nanên sûkê nake. Balonek bi
hezarî, benîştek bi hezar û pênc sed wereqî ye. Her tişt
227
bûye agir, mirov nikare tengî bibe. Ji xwe mirov qet nikare
behsa goşt bike. Bihayê mirîşkekê bûye du sed hezar.
Kîloya goştê pez bi sê sed-çar sed hezarî ye. Xelkê vir
tehma goşt ji bîra kirine...»

Circîs piştî ku pêncî hezarê din jî da dest Cidhên, Durê xwe aciz kir:
«Kalo, ne nabe ku em van pereyan bidin bi nepox, benîşt û şekirk mekirkan.»
«Guh nedê Pîrê, nîvê hezarî pênc sed e. Keçê me ho kirye û ho xwariye. Dev jê berde...»
«Xebera Pîrê ye. Divê hûn bi tedbîr tevbiqeliqin. Bi a zarokan nekin; zarok ji keleşan jî xerabtir in. Ji dêvla şekir, wan hînî petatên kelandî bikin», Fermên got û sekinî.
Circîs piştî ku di ber xwe de got «aha ev jî tiştekî nuh e», jê pirsî:
«Ez xulam, ma te xwest tu ji me re çi bibêjî? Kerem bike bibêje.»
«Ezbenî, exlaqê zarok û keçan yek e. Mirov divê hîç bi a wan neke û wan serberdayî raneke. Keç bêûjdan û bêexlaq in. Keça gava ku te serê wê berda û te li gora dilê wê lêxist, wê bibe wek dêlika bi ba û xwe di mala bavê de avis bike», keçên wî hatin bîra wî, «halo kirin. Îcar zarok jî halo ne. Ma mirov di ber zarokan û kirînê re digihê, Xwedê ji we razî! Rêya wê ev e:
Hema wan çi xwest hûn jî navê wî tiştî li petatan bikin û petatan ji wan re bikirin. Gelek şiklên petatan hene. Petatên xarînî, gokînî, kurimî û werhasil. Li vî welatî tiştê herî erzan petat in. Em ji nên bêhtir wan dixwin. Ê ne hûn nizanin bê ji van petatan çiqas şiklên xwarinê çêdibin.
228
Mesele tirşika petatan, petatên qelandî, petatên biraştî, petatên kelandî...»

Niyeta wî û sekinê tune bû. Di şiklê yazdehan de Circîs gotina wî birî:
«Ma gelo mirov nikare wan biçîne jî?»
«Ma çima mirov wê biçîne, li halê wek axê ne. Bi çewalan diavêjin...»
229
BEŞÊ YAZDEHAN
1
Ji kurdên dorhêla Kextayê bû. Xortekî bîst û pênc salî û wek cin jêhatî bû. Çavên wî di nava serê wî de dilîstin. Bejin û bala wî dişibiya boqa pîvaza nav rezan. Qut î ziravokî bû. Sermezin, rûgirover û çavreş bû. Birhû, simbêlên wî ên qalind û bêvila wî a qulingî pev diket. Li akademiyê beşê «Buyuk Turk Cûmhûriyetî Tarîhî» xwendibû û doktora xwe jî li ser Atatirk kiribû. Piştî ku ji Reyis teqdîrname stendibû, ponijîbû û li xwe werqilîbû. Fêhm kiribû bê çi diqewime, lê ji bo çi wilo dibû ji hev dernedixist. Bi xwe dizanîbû ku ne dîn e. Fikar û hisên şexsî divabû kolektîv ba. Berevajî wê dînîtî bû. Partiyê bi salan ew bi wî aqilî perwerde kiribû. Lê kiribû û ne kiribû ne ketibû serê wî. Bawerî pê ne anîbû ku bi rastî Atatirk dostê miletê kurd bû. Tê ne gihabû bê çima Reyis her gavê digot dijmin û xayinên herî mezin di hindurê partiyê de ne. Yekî endam gava li cihekî bi tenê bimaya, pêşî divabû bifikiriya ku wê mirov çawa bikarîba derbek li dijminê xwe bixista. Gava bûbûna dudu, divabû fikar derbasî kirinê bûba û êrîşî dijmin kiribana. Lê heger di wê navê re îcar dijmin xwe ji ber wan veşarta û neketa zeftê, ew jî dihat

maneya ku hevalê wî xayin e û hema di cih de divabû hevalê xwe bikuşta. Îdeologên partiyê her roj ev derz dabûnê. Hîç ne ketibû serê mêrik. Û partiyê jî ew yeka han ferq kiribû. Reyis jê hatibû bêvilê! Di dawiyê de sûretê xwe pê re kişandibû û ew rêyî herêma Egeyê kiribû. Nûnerê herêmê jî piştî ku du hevalên wî ên «xayin» pê

230

dabûn kuştin, ji bo demeke kurt ew wek propagandîstê partiyê rêyî Ozgurluk Koyu kiribû. Pê pere jî didan hev. Lê çawa hatibû gund, wilo jî bi Circîs û kufletê wî daketibû û temamê propaganda xwe li wan serf dikir. Bûbû benîşt û bi wan ve zeliqîbû. Her roj piştî ku çend seetekî li bin kon rûdinişt, diçû û dîsa dihat tiştên berê ji wan re digot. Circîs bi qasî Reyis jê aciz bûbû. Sebeba aciziya wî a herî mezin jî li ser ku çima bi wan re bi tirkî dipeyivî. Ew bêminet bikira dibû ku çend zarokên wî bihatana kuştin; nekira derdekî din bû. Pê re ketibû qelaqê! Circîs û Ferman diwenisîn û Bulentê kextayî bêmefer xwe dada bin kon.

Herduyan jî da xwe ku ji ber rabin. Lê wî guh neda wilo, li bayê leza xwe:

«Merheba hevalino!» got û rûnişt.

Lê wan hîn bersiva merheba wî ne dabûn, wî dîsa got:

«Ê de ka bibêjin bê hûn ji bo partiyê çi dikin û çi nakin? We çend kes kirin heval? Hîç. Ma dibe ku mirov hema li mala xwe rûne, bixwe û vexwe û tu alîkariyê bi partiyê re neke...»

Tirkînî bi nava Fermên ket. Çend roj bû ku ne çûbû

parsê û bêşa xwe ne dabû. «Na na na, nabe! Hûn hemû bi
xêra partiyê li vir dijîn. Heger ne ji tirsa partiyê be, dewleta
tirkan seetekê we li vir nahêle. Ji bo wê, hûn mecbûr
in her tiştî bikin...»
Ew wilo dipeyivî û Fermên jî dida aqilê xwe:
Gelo ev sêwlek ne hetibe doza parskirinê li Circîs jî
bike? Hîn zû ye, gerek niha ne hatiba...
Bulent di vê carê de ji bo wilo hatibû.
Circîs jî bêkip sekinîbû û ji devê wî bêhtir li cilên wî
231
dinerî.
Qutikê wî ê sipî ji çakêtê wî ê gewr bi qilêrtir bû.
Ewqasî bi qilêr bû, te biguvaşta devê maran wê mar verşiyabana.
Delingê pantorê wî ê çepê fetiqîbû. Ji qermîçokên
pantor vekirî xuya dikir ku navran lê fireh bû. Çakêt jî.
Sola wî meqabeke kevin bû. Sola rastê ji qalibê xwe ketibû.
Circîs xwe ne girt:
«Oxlim, bi me re bi kurmancî bipeyive», got û herdu
lingên xwe pev re li erdê xistin.
Bulent bi xwe ne xweş anî. Çavên wî ên zerdoqî mîna
ên pisîkan lîst û biriqandin:
«Eyb e eyb! Oxlim nebêje, heval bibêje! Ez ne oxlimê
te me.»
«Baş e baş e, ser çavan; hema ez oxlimê te jî, ma wê çi
bibe. Lê bi kurmancî bi min re bipeyive, temamdir
ewlad!»
«Mirov wilo jî nabêje.»
«Bi kurmancî bipeyive û dirêj neke!»

«Ez ji Dêrsimê me û ez bi kurmancî nizanim.»
«Ê ez jî ji Nisêbînê me û bi tirkî nizanim. Weh, bi tirtirê
nabe bavê min!»
«Dêrsimî bi kurmancî nizanin, heval.»
«Kuro ev tu çi dibêjî, tu bi me re wek zarokan dipeyivî.
Dêrsimî çawa bi kurmancî nizanin!! Kurmancan çilpêncî
sal berê li Dêrsimê şerê herî mezin bi eskerên tirko
re kirin...»
«Haaa, tu ji serhildana Seyid Riza re dibêjî. Ew ne kurmanc
bû, zaza bû.»
«Hah, îcar çêbû, ev xweş bû. Selewat li ser navê
232
Xwedê û pêxember. Bi zarê wî camêrê mezin bi min re
bipeyive.»
«Ez bipeyivim jî tu fêhm nakî.»
«Bila ez fêhm nekim. Hema çawa be, wê ew deng bi
min xweş bê. Bi tirkî nebêje! Bêhna min teng dibe û ez ji
exlaq de dikevim, lahewlelwela!»
Di eslê xwe de bi qasî ku Circîs jê fêhm bikira, bi kurmancî
dizanîbû. Lê xwe li zimanê xwe ne dikir xwedî. Ji
ber fedî dikir.
«Bi tirkî baştir e. Û tu jî bi qasî min bi tirkî dizanî. »
«Kuro heval, ez bizanibim jî ez napeyivim. Ellahummeessaabirîn!
Ma qey tu ne kurmanc î?» got û bi herdu
destên xwe herdu qulên guhên xwe girtin.
Di vê navê re Durê jî qedehek çayê, du nanên sêlê û
çend lib zeytûn li ser tepsiyê danîbûn û ber pê de dihat.
Piştî ku jê re got «neyne, ez xwarina we naxwim», wek

conegayê ku nuh av tê de digeriya û xwe ji aliyê dev ve
diavêt ser çêlekê, wilo bi Circîs ve hilperikî:
«Tu bi vê helwesta xwe a feodal û kirêt, vekirî dide
xuyan kirin ku tu çiqasî dijminê gelê tirk î. Partî vê yekê
ji te qebûl nake. Partî di te nabihure!...»
Dura ku ji aliyekî ve ji zimanê wî fêhm ne dikir û ji aliyekî
ve jî têgihabû ku pîs dibêje, xwarin li ber danî û got:
«Erê lawê min, de ka niha taştêka xwe bixwe, bila partî
ji me qebûl neke.»
Wî dîsa jê re wek a berî niha got.
Circîs bi pêxêla xwe girt, qutikê xwe çirand û qêriya:
«Kuro çi ji qûna partiya te tê bila texsîr neke!...»
Fermên bi destê Circîs girt:
«Ez xulam, meseleyê negihîne heta wir, ez karim ter-
233
cûmaniya we bikim. Heval di nav tirkan de mezin bûye,
nizane bi kurmancî. Ne eyb e ku mirov kurmanc be û nizanibe
bi kurmancî...»
Circîs piştî ku tercûmaniya Fermên qebûl kir û Ferman
jî heq ji karê xwe derneket, herdu destên xwe bi ser herduyan
de hejandin û bi qîje wîj got:
«Erê, erê, erê, kuro ev hûn çima fêhm nakin! Gava
dengê tirkî tê min, eskerên ku li êşkencexaneya tûgaya
Mêrdînê, hepsa Diyarbekirê û li ser bênderên Zorava
dikutan me, tên ber çavên min!»
Hemû bêhnekê sekinîn.
Circîs vê carê jî:
«De bike, bike! Jê re tercûma bê eskeran xwe çawa

diavêtin ser jinên me, bike, bike!» got û ziq li herdu çavên Bulent nerî.
Bulent xwe li ber awirên wî ne girt. Bi hişim rabû, tiştek ne got û çû. Circîs pîrekî perixî bû û ew jî ji pîran ditirsiya. Di mirovên pîr de mirin didît û qudûmê wî ji mirinê dişikest. Gava ku mirovekî pîr didît hema pê re mirin dihat bîra wî. Dihat bîra wî lê dîsa jî dikarîbû bi insanan re çort bipeyivya û ew bikuştana.
«Bavo wilo dewlet nabe; ez ê çi bikim ji wê dewleta ku ez ê di mista tercûmanan de bi qomandarên kurmancan re bipeyivim. Van hîn ji serî de bi bêbextî rahiştine me. Derewan dikin. Tu elaqê wan û kurmancî û mirmanciyê bi hev tune ye.» Reşo û Serdar hatin bîra wî, «belkî di destpê kê de ne wilo bûn, lê dû re bi carekê ve xerab bûn û bi xelkê xwe daketin», got û keysa xwe li xeberdanê xweş kir.
Lê Fermanê ku di cihê xwe de ha ha diqeliqî, rê nedayê. Bêyî ku çixareya di nav lêvên xwe de pêxîne
234
destê xwe hejand û sivik got:
«Tu zanî bê van wek çi bi me re kirin?»
«Wek çi?»
«Wek keftêr. Pêşî ji me re heta ku em bi sur xistin stiran û qesîde gotin û dû re jî werîs di stuyê me re derbas kirin, pîjik û xîçkên me girêdan û bi daran ketin ser dilê me. Em ji fersenda xwe ketine. Hinan ji tirsan, hinan ji welatperweriya xwe, hinan ji pêxwasiya xwe, hinan ji nezaniya xwe dane dû wan. Ne hezar, ne deh û ne bîst hezar in, bi sed hezaran bi dû wan de ne. Bi qasî dewletekê

xurt bûne. Berberiya bi wan re xwediyê xwe dikuje. Tu neheqî ku tu dikevî kirrê wan. Karin derbina li zarokên te xînin. Li vir li gelekan xistin.»
«Yanî li vir jî em ê ji destên wan xelas nebin, ha?»
«Ji xwe li vir em tam di nav destên wan de ne. Dewlet bi me elaqedar nabe. Digel ku di nav me de polîsên xefî hene jî, bi navê mehkemeyê mirovan mehkeme dikin û heşkere heşkere wan dikujin. Ha li vî gundî û li van herçend gundên derdor, bi vî lewnî gelek kes kuştin.»
«Wilo jî heye, ha!»
«Ûûûû, hîn gelek tiştên ku tu ê bibînî û ez ê ji te re bêjim hene, bavo. Ma tu zanî bê ev serserî çi karî dike?»
Behetî pirsî:
«Çi karî dike gidî?»
«Li ser navê partiyê ji mirovên ku li ber mizgeftan û li vir û dera han destê xwe vedigirin, pereyan distîne.»
«Batil!!»
«Rast e, ev ne tu ûjdan e. Lêbelê ûjdanê wan qebûl dike.»
«Qey hayê partiyê jê tuneye.»
235
«Ih li aqilê wî ku dibêje qey hayê partiyê jê tuneye, dolmîş bi xwe ên partiyê ne. Şifêrên wan jî hemû endamên wê ne.»
«Tu çawa dizanî?»
«Ew bi xwe dibêjin ezbenî. ‘Ji bo partiyê mirov çi bike xêr e. Pêşî Reyis û dû re partî di ser her tiştê miqedes re ye. Endam ji bo menfehetên partiyê kare bi Şeytên û insanê

herî deyûz re jî rûne; ji parsekan peran bistîne, esrar û efyonê bifroşe, bavê xwe û dêya xwe, xuşk û birayên xwe bikuje.' Ev gotinên wan in. Lê gava ku li wan teng dibe û bi kesên têgihiştî re rûdinin, li van tiştan jî xwedî dernakevin. Van fehalên xwe ên genî, bi haweyê ku xêrnexwaz û ajanan li ser navê partiyê kirine dibêjin. Ma qey li ba wan eyb û fedî heye. Du gotinên wan hevdu nagirin. Her roj tiştekî dibêjin. Wek hilqizmilqiz in, kuro! Min jî digot qey tu ji min çêtir wan nas dikî.»

«Tu rast dibêjî ez xulam; wilo ye wilo ye», got û li devê deriyê kon nerî.

Hevalbenda Bulent, Cananê dihat. Canan mezina wî bû. Çend carekî bi Circîs re rûniştibû û li ser «mafê jinan» ketibû xulqê wî. Zimanê kurdî ji malê hîn bûbû. Di nav xeberdana xwe de gotinên tirkî bi kar dianîn. Lê bêhna kurdî pê dixist û digot. Omerî bû û li Izmîrê mezin bûbû. Li Kadîfekaleyê rûdinişt. Keçeke têra xwe sipehî bû. Lê mezinahiya tilmiqûnan û bejina wê a ku ji navê û berjêr de kişiyabû, qisûr dixist sipehîbûna wê. Canana bîst salî bi qasî sêpiyekî dirêj bû, lê ji navikê û berjor de jî qey gazekê dirêj dihat. Newqzirav bû. Kezîzer, lêvtenik û bêvilguhîjî bû. Ji memikên wê ên ku wek dûvberanan bel sekinîbûn, xuyan dikir ku hîn jî bê yar bû. Yan jî memikên xwe

236

ji delalîkê ber dilê xwe re parastibûn. Serikê wan mîna dendikên mewîjê di qutikê wê ê şîrikî de çikilîbûn. Çavreşeke rûgewrî bû. Heger qirika wê jî ne ewqasî kin ba, dibû ku serafên keç û jinên Ozgurluk Koyu, di qisûrên wê ên

din de ne gihabana û dest danyana ser wê jî.
«Roja we bi xêr be malê», ji pîrekan re got û xwe li herdu pîran girt.
Pîran dan xwe ku ji ber rabin, lê ew bi hirmet bi wan ve beziya:
«Hevalino na na, ez ricayê ji we dikim li cihê xwe rûnin!»
Vê keçika ku dîsa pantorekî teng î gewr li xwe kiribû, li himberî Circîs çarmêrkî rûnişt, serê xwe wek ê sihor rakir û danî û hema wilo yekser dest pê kir:
«Tu çawa yî heval?»
«Xwedê stara xwe li te bike, ez baş im, keça min.»
«Lê tu baş xuya nakî.»
«Ê keça min wilo ye, yextyarî ye. Emrê min çû. Ez ji zû de li ser neqebê me.»
«Na na, tu ê hîn gelek salên din yaşamîş bibe», got û berê xwe da Fermên:
«Hevalê Ferman, îcar tu çawa yî?»
«Teşekur dikim hevalê. Xwedê te û...»
Ne hişt ku dawî li sipasiya xwe bîne.
«Hevalê Circîs, ev çima ji mala we hevalên jin qatilmîşî nav komîta jinên gund nabin? Ma qey ew jî ne insan in, hi?»
«Keça min, jinên vê malê ne xwende ne; ji qormîta tiştekî fêhm nakin û wê kar marê we hemî li bin guhê hev xin. Keçên min hîn bajar ne dîtine. Di nav pez û dewaran
237
de mezin bûne.»

«Na heval wilo nebêje! Jinên vî heyamî hemû jî bilgîlî ne.»
«Dibe ku wek te be, lê têgihiştina ên min hemû jî li ser heywên û çandiniyê ye.»
«Ez bawer nakim ku di roja îro de, li gundê herî kevnare jî jinên cahil mabin.»
«Keça min, dibe ku li vî welatî wilo be. Lê li welatê me ne wilo ye.»
«Na na, li welatê me jî wilo ye», dengê xwe bi ser ê wî xist û got.
«Baş e, bila ew jî wek te be; lê ên me ne ji wan jinan in. Ne çûne medreseyan û cahil mane.»
«Hevalê Circîs, ez hîç bawer nakim ku tu rast dibêjî. Lê heger cahil bin jî divê mirov wan bilgilî bike...»
Cananê bi rûniştina xwe ne rehet bû. Pantor, tilmiqûnên wê mîna du gokên fitbolê zewirandibûn û ew bi hewa de bilind kiribû. Digel ku destên xwe ji kelêx re wek stûnê bi kar dianîn, dîsa jî bêsekin bi çep û rastê xwe de ditewiya.
«Malîno, ji vê mêhfana me a ezîz re kursiyekî bînin. Ew wek me hînî rûniştina ser cil milan ne bûye», Circîs got û heta ku kursî hat li Cananê nenerî.
Jê re bi kursiyekî ku Hesûk çêkiribû re doşekeke piçûk jî anîn. Kursî telomelo bû. Lê qewîn bû. Doşek têra xwe qilêrî bû. Bala wê jî kişand. Pêşî xwest ku li ser rûnenê, lê fedî kir û di bin xwe de ediland.
Cananê piştî ku got «ez teşekur dikim hevalê» û rûnişt, Circîs dîsa bang kir:

«Şerpeyekê jî bînin, da bi ser çongên xwe dake...»
238
Patîkeya di nav şeqên wê de, mîna berkurka kewê bel
bûbû û zor dida zincîra pantorê wê.
Maliyan ew jî anîn. Wê jî bêyî ku tiştekî bibêje şerpe
bi ser çongên xwe dakir.
«Hevalê Circîs, şoreş bê jin nabe. Û em kurd jî hîç rê
nadin ku jin qatilmîşî nav şoreşê bibin. Ma hetanî kengî
em ê wilo feodal kafa bimînin û keç û jinên xwe dûrî şoreşa
Kurdistanê bigrin.»
«Rast e keça min, pevçûna herî mezin jin dikin. Li pişt
her mêrê çê, jineke kihêl sekiniye...»
Ne hişt dom bike.
«Heval, jin çima kirî li pişt mêr bisekinin! Çî mêran ji
ên jinan zêdetir in? Hîç. Hetanî ku kurdên me dev ji van
gotinên gerîciyan bernedin û bi saygî û sevgî jinê nexin
pêşiya xwe, wê halê me ev perîşanî be.»
«Keça min tu şaş î, kurmanc hirmeteke mezin didin
jinên xwe. Keça ku mêr kir û bû xwedî zarok, li civata
mêran rûdine. Mîna mêran dide û distîne û dipeyive. Mêr
pê re diçe eşêfa nav rez û bîstên, diçe paleyê û bêriyê, gêrê
dike û zêd li bêjing û seradê dixîne. Ez çi zanim, gelek
gelek karî bi hev re dikin.»
Bi zirt got:
«Heval ne wilo ye! Heger qîmetê keçan li ba mêran
hebûya, wê li ser ku jinên wan keçan tînin, bi jinên xwe re
pevneçûbana.»
«Ew tiştekî din e. Û ew tişt jî ji bêgaviyekê tê. Keça

gava ku mêr kir, ji ba dê û bavê xwe diçe. Lêbelê law pêncî jinî bîne jî, nabe ku dev ji dê û bavê xwe berde. Law mecbûre wan hilîne û deyne û hetanî bi dawiyê, wan bi xwedî bike. Aha ev e meseleya ku kurmanc dibêjin 'law û
239
law.' Keç ji bedena bavê ye. Ma dibe ku mirov ji bedena xwe hez nek. Hindurê malê bi keç û lawan şênî dibe. »
Fermên da ber:
«Û sebeba din jî ji ber ku şer û pevçûn bi zilaman dibû û em kurmanc jî her tim bi hev re di xirecirê de bûn, ji me re law lazim bûn. Lawan...»
Herdu zendê xwe ên tazî bi hev re bilind kirin:
«Heval tu bisekine!»
Hinavên Heval, wek trêna ku mirov ji nişkê ve firênê wê bigre, li bin guhên hev ketin; him sekinî û him jî serê xwe berda ber xwe. Circîs pê êşiya. Lê bi a êşa dilê xwe jî ne kir.
«Ji yazdeh neviyên min ên ku di nav şoreşa we de hatin kuştin, sisê jê keç bûn.»
«Lê ma gelo te ew şandibûn nav şoreşê? Ez bawer nakim, heval.»
«Na, çûna wan ne bi min bûbû. Lêbelê min dê û bavê wan jî bi wê çûnê, ceze ne kirin.»
«Lê a lawan bi te bûbû, ne wilo?»
«Ne hemû.»
«Heval, ez ê pirsekê ji te bikim?» bi wahc got.
«Bike keça min.»
«Ev niha pêşî ez dixwazim fêhm bikim. Tu qebûl dikî

ku keç û law bi her tiştê xwe wek hev in?»
«Na.»
Soro moro bû.
Piştî ku dîsa ji nişkê ve serê xwe rakir û porê zêrînî,
xwe ji ser çavan da alî, «çima, çima?» got û bi herdu lingan
erd tiktikand.
«Hema yek jê keç rûniştî û law jî rabûkirî dimîze. Ma
240
dibe ku keç şipya bimîze? Na. Ew bixwaze jî nabe. Mirov
jî bixwaze dîsa nabe. Em insan wilo çêbûne, keça min.»
Ne li bendî gotineke wilo bû. Tam ji ser xwe çû û vê
carê jî a di dilê xwe de got:
«Temamê hevalan dizanin ku di vê malê de qadin heqî
tuneye!»
Circîsê ku xwe bi ser hev de zewirandibû û wek stêreke
çilmisî lê dinerî, bi destê xwe re serê xwe tewand û bi
helke helk got:
«Keça min, hêdî hêdî. Tu di ser me re rûniştiye. Ew
qadin heqî jî heye.»
Bi ser hilbû:
«Tuneye, tuneye!» got û bi lez çixareya xwe pêxist.
«Çima tuneye?»
Piştî ku li ser hev du-sê hilm li çixareyê xistin, qûnika
wê mijt û cût û nêvcî avêt, destê xwe ê çepê rada û kişand
û bi tilîkan sivik sivik hejmart:
«Te ne jinek, dudu-sisê-çar-pênc-şeş-heft-heşt jin li
mêrekî mehr kirine! Ev çawa qadin heqî ye, hi! Û ji min
re bes bêje ‘keça min û keça min û keça min!...»

Circîs xwe nema girt; rabû ser kaban û bi zarê bûblankî pê de pijiqî:
«Heval-togê, me ew mehr ji bo selameta nav şeqên qadin heqê te kiriye. Ma qey xwe li sikakan di bin xelkê de vezilandana baştir bû, hotirê! Rûşûtiya heram, zû rabe ji mala min derkeve!...»
Piştî ku bi lez rabû ser xwe, mîna cendermeyên Stilîlê xwe bi ser de hejand û bi dengekî bilind got:
«Tu ê ji mala partiyê berdî partiyê, ha! Cahş adam! Hayin morûk!...» û bi lez ji bin kon derket.
241
Vê keçikê jî li akademiya partiyê beşê «Buyuk Halkla Îlîşkîler» xwendibû. Û bi Circîs re jî wilo dipeyivî. Li gora hin endamên partiyê, Cananê divabû bi xelkê Tirkiyê re di têkiliyan de ba. Lê ji ber tunebûyina kadroyan, partiyê ji bêgavî ew rêyî mala Circîs kiribû. Wilo dihat gotin.
Durê bi çûna wê re ji qorziya kon dengê xwe hilda û ber bi Circîs de meşiya:
«Kalo, li vir jî star ji me re ne maye. Em her roj dibên xwezî bi doh. Em divê li cihekî din ji xwe re bisebibin. Em ji ber şirikê hatine ber mezrîbê. Wey sed xwezî bi Gebro û temamê hevalên wî! Axayê me bû Pilo, êmê kerê bû çilo. Pêşiyên me rast gotine. Ev hemû pilo milo ne, wey bimir! Îcar em ê bi van tiredînên han ji destê tirkan xelas bibin, ha! Wey li minê, em hatine ber lingên zigurd û şadîkên kolanên Izmîrê!... »
«Rast e rast, bi golikan gêre nabe, ga lazim e. Mêrik gayên me hemû xerab xistin û dû re jî ser jê kirin. Bav û

kalên me bi derewan ne gotine ku ‘lêhatin ji jêhatinê çêtir e.’ Lêlê Pîrêêê, ji mêrikan re li hev hatiye. Keçê xwezî bihiştana hema bi rehetî me ew çiloyê Piloyê te jî bixwara, lêêê!»

«Lawo wileh ne wek we ye, weh! Mirov dibê qey van nan bi guhê xwe xwariye, li nav insanan mezin ne bûne. Bêlome be ev çi teba ne!..»

«Keçê dêya Serdêr, bi xaliq tu xweş dibêjî. Lê de ka cihekî ku em ê pê de herin jî pêş me bike, wî çaxî erê aha. Cihê çi, ma li ser ruyê vê dinyaya teres cih ji me re maye qey! Pîrê, em li vir man û man. Howeh li vê ecêba ku bi serê guran de ne hatiye! Em nema dizanin bê em ê bi çi bibezin û bi çi nebezin; bi berberiya li himberî eskeran, bi

242

çavsoriya barûteyên partiyê, bi zikê xwe, bi nexweşiyê!..»

«Ez xulam te ne baş kir ku te cewaba wan da», Fermên got û serê xwe berda ber xwe.

«Ih, de ji xwe re li dostê min binerin!»

«Heyran, bi mêrikan re berberî nabe. Hinekî barbihêr be. Em di dewreke halo de dijîn bê bêlome be! Hetanî bi xwediyê ezmanan jî bûye dijminê me! Em ji bo kuştin û pîskirinê xuliqî ne. Li Kurdistanê kurmancê av tê de digeriya, gava ku bi haweyekî xefî yan heşkere nehata kuştin, li êşkencexaneyê yan li girtîgehê dihat kuştin. Lê gava li êşkencexaneyê û girtîgehê jî nehata kuştin, vê carê jî bi trafîkê diçû. Bi tenê tiştek maye, ew jî ku zelzeleyek li me rabe. Û bi sûnda herî mezin wê Xwedê wê jî bi serê me de bîne. Yanî xelasiya me tune...»

Circîs li bendî bê çima wilo dibêje nema. Destê xwe hejand û got:
«Rast e, rast e, Xwedê wahşet kiriye qedera me. Heger hêsîrî pişka ezl ne daba me, çima wê ew ecêb û ecêb bi serê me de bihatana? Mela dibêjin ku her tişt bi emrê Xwedê dibe. Baş e, naxwe doza çi li me dike? Him wê me bixwiliqîne û him jî wê wilo li serê me bike...»
Durê hinekî xwe aciz kir:
«Bavo hûn wek kafiran dipeyivin, dev ji wî berdin bi van ên din dakevin. Ka pêşî halkê me safî bikin û dû re herin tivingan berdênê...»
Circîs di ber re ne ajot. Li Fermên nerî. Fermên jî ji cihê ku lê sekinîbû dom kir:
«Min bibexişîne ez xulam, dev ji namûs û şerefê berde û mîna min pîsiyê ji xwe re bigre. Bi çi haweyî dibe bila bibe, li rêyên qedandina vî kufletê xwe ê giran bigere.
243
Heger tu nav xwe û wan xweş nekî, wê temamê vî gundî û heta bi bajarê Izmîrê li himberî we rakin û çi tahdeya ku heye li we bikin. Li gelekan kirin. Û di dawiyê de jî mêrikan teslîm bûn. Binere, wî çaxî ez bi xwe ez ê nema karibim nêzîkî we bibim. Keç, xort û zilamên te hene. Ev qewetek e. Hişê xwe bîne serê xwe û vê qeweta xwe bi konebazî li himberî wan bi kar bîne.»
Ev jî ji bo wî tiştekî nuh bû. «Çi çi, çawa çawa?» got û devê wî vekirî ma.
«Çi çawa, poşmanî û solalêsî. Poşmaniya xwe bîne. Çawa ku poşmanî ji bo sofiyekî îbadeta herî mezin e, ji bo

partiyê jî ew e. Birek mirovên sikakan, xwenda û zana di hindurê partiyê de bi solalêsiya xwe him devê ên mîna min û te çirandin û him jî bûn xwediyên xwe û milyaran. Çerxa zemên bi hêzê digere û ew hêz jî îro ketiye destên xwefiroş, bêbext û xulamokan. Dev ji xwe berde. Min ji te hêviya ku te ê ev tişt ji min re bigotana dikir. Min jî mîna te kiribû. Ez dereng bi xwe hisiyam, dereng. Ji bo ku ez xwe pîs nekim, min heta bi dawiyê li ber xwe da. Dawî hat û vê carê jî ez hîn pîstir bûm. Ji dêvla ku hema yekî ji min re bigota eferim ji camêrî û mêrxasiya te re, tew ji min re gotin cahş. Bi a min bike. Hûn hîn jî têra xwe hene. Mirov dibê qey we bi Reşo re nan ne xwariye.»

Durê destê xwe danî ser devê xwe, ecêbmayî lê nerî û ecêbmayî jî peyivî:

«Pepûk li min evdalê, bê çi rêyan dide ber Kalo!»

«Rast e, ez tiştên ku bi insaniyetê nakeve dibêjim, lê ma insaniyetî maye! Ma ev exlaq e ku sêwlekeke kolanan mezinahiyê li civateke wek me bike û me bide ber şeg û pegan! Li welêt ne bes bû li vir jî dikin. Him jî bi hawey-

244

ekî pir xerab! Ma ev ûjdan e ku mirov can û malê xwe di oxira partiyê de telef bike û partî jî dû re rabe mirov cahş ilan bike! Xeta mirov çi dibe bila bibe. Kî pir kurmanc bûn canê wan bêhtir şewitandin. Ên ku pir zana bûn, xelkê xwe li dora wan digirt û qedir û qîmet dida wan, berî her kesî kuştin! Li Torê camêr ne hiştin. Ezbenî, gava ku mirov ne hevalê wan be, mirov bi namûs dibe, şêx, ewliya û pêxember dibe, fêde nake. Bi qasî ku mirov mezin be mirov pîs

dikin.»
Durê dîsa wek a berê got: «Birakê mino, ji bo ku em
xwe pîs nekin em di van deran re derketin. Hema bi Êlim,
ger qira me jî bînin, me xwe bi destê tortorekan berneda!»
«Xweha minê, heger we jî mîna min şerha gotinên
civatî ji bîra ne kiribana, ne tu ê halo bipeyivya û ne jî wê
ev ecêb bi serê we de hatibûya. Diz, pêxwas, zigurd, tortore,
dilsoz û camêr kî bûn û wê mirov li himberî wan
çawa tevbigeriya, gergerekên civatê ev hemû şerh kiribûn.
Di civatê de cihê virek û solalêsan tune bû, lê me cih da
wan û em li tenişta wan rûniştin. Mirov wê bi haweyê zilaman
bi xortan re ne kiriba, lê me kir; me xort zilam dîtin
û me da dû xortan...»
Circîsê ku ecêbmayî lê dinerî: «Ez xulam tu wek aliman
dipeyivî,nebe tu alim bî?» got û dîsa gotin jê re berda.
Ferman lê germ bûbû. Dengê wî nebir xwe. «Gava
mirov ji yekî re bêbext got û pê re meşiya, divê mirov jî
meşa bi bêbextan re baş zanibe. Gergerekan ev şerh kiribûn.
Lê em bi wan re piştrast meşiyan. Me ji ên wek ev ên
ku berî niha em rezîl kirin re 'naşîk' digot û me xwe kir
hevalê naşîkan. Karê me sivik bû, me li xwe pir giran kir,
me me!...»
245
2
Di a din î rojê de bi êvarkî re du endamên partiyê derbasî
bin kon bûn û li devê derî wek du singan sekinîn. Piştî
ku çavên xwe li ser maliyan gerandin, rast xwe li Circîs
girtin û bêyî ku tiştekî jê re bibêjin li pêşberî wî rûniştin.

Herdu jî bi demaçe bûn. Yek ji yekî mezintir bû. Ê mezin bîst û du-sê salî dihat. Girs bûn. Yek bi simbêl, yek bê simbêl bû. Ê bê simbêl çefiyeke sor dabû serê xwe, lê bê çakêt bû. Vîna ji bîstan û berjêr de xuyan dikir. Ê din parkekî eskerî li xwe kiribû. Xuya dikir ku parkê wî di nav ava sar de hatibû guvaştin. Boyaxa reş bi tenê lêvedabû. Pantorê herduyan jî qedîfeyî û şîn bûn. Lê him pantorê ê bi simbêl û him jî meqaba di lingên wî de, ji a ê din nuhtir bû. Qutikê wî jî. Mahdtirş û lêvhildayî bûn. Çavên wan li hewa direqisîn. Bi her haweyî xerabî ji ruyê wan difûriya.
«Lawo Xwedê xêr bike, ev çi hewala we ye?» Circîs got û li bendî bersiva xwe ma.
Malbat li ser hev bû û ji bilî Circîs her kes li ser şîvê rûniştîbû. Hesûk dev ji şîvê berda û devê xwe bir ber guhê vî, wî û ên din:
«Zû zû, bila her kes kêrekê di ber xwe rake û bê deng li ba wan rûne! Û gava min ji we re got lêxin, bi haweyê kuştinê lêxin. Çend û çend ji van re, waweyzê!...»
Di malê de sê kêr hebûn. Hesûk, Serhên û Nesîmayê kêr di ber xwe de danîn. Ên din jî rahiştin bêr û bivir û xilçan û wek ku hatibû gotin kirin. Lê Cidhên wek yekî ji wan jî ne kir. Piştî ku xêrhatin di wan da û rahişt destê wan, rûnişt û ji ilmê xwe peyivî:
«Bi rastî insan mexlûqekî heta tu bê bes xerabe ye.
246
Heyvanê êqil di serî de tuneye.»
Mirovê bi simbêl, bi simbêlên xwe lîst, awirek tê firand û got:

«Heval ev tu çi dibêjî? Hinek açik bêje.»
«De ka bihêle bê ez ê çi bibêjim.»
Hişt û serê xwe berda ber xwe.
«Xwedê, insan ji bo ku qudreta wî nas bike xuliqandiye. Insan ji bo ku tehmekê ji dinyayê bikin hene. Lê tehma çi! Tehm li xwe kirine ziqilmewt û quzelqurt. Xwedê, insan ji bo ku bi kêrî hev bên û dinyayê ji xwe re xweş bikin, ewqase insan dane dinyayê. Lê insan jî ketine pêxêla hev, ha ha hevdu dikujin û dinya li xwe kirine cehnime.
» Her kesî bê his û pis lê guhdarî dikir. «Insan her tim miriye, ji ber ku bi mirinê re dijî. Mirin di terempêlan, trên û teyaran de ye; mirin li nav malan di koncalekê de li pêşiya me sekiniye; li ser rêyan bi me re dibeze; di hindurê malê de bi me re rûniştiye. Mirinê derdora me rapêçaye. Tew bi ser de jî ketiye nava me. Her bêhnik dil dikare bisekine, roviyek dikare biqete, hûr ji vê xwarina bi kerş û gemar biçilvire, kezeb hilqete û mejî xwîn bigre. Ma ne wilo ye yabo?»
«Wilo ye lawê min. Bibêje, tu xweş dibêjî.»
«Feqîr bêaqil in, lê zalim ji wan jî bêaqiltir in. Alemê birçî dihêlin, digirin, dikujin, bi dinyayê de diterqînin û nafikirin ku wê ev dinya ji wan re jî nemîne. Ma kê bi qasî siltanan hikim li dinyayê kir û insan kuştin, hi? Lê di dawiyê de ew jî çûn. Ma ne wilo ye yabo?»
«Wilo ye lawê min.»
«Tiştek ji qenciyê xweştir û ji xerabiyê jî pîstir tune. Qencî camêrî û xerabî jî çavsorî ye. Ma ev jî ne wilo ye

yabo?»
«Belê lawê min, belê.»
«Xwedê û pêxemberê wî...»
Ê bi simbêl gotina wî birî:
«Bes e heval! Em ne sofî ne, sofî li camiyê ne, here ji wan re van wazan anlatmîş ke», got, destê xwe dirêjî pişt xwe kir û bi qevda demaçeya xwe lîst.
Ev ên din jî çeng bûn. Nesîma destê xwe dirêjî paxila xwe kir û gavekê ber pê de meşiya. Serhên bi zendê wê girt. Sekinî. Faro serê bivir ji erdê rakir, Saliho bi newqa destiyê bêrê girt û qederekî hilda. Keçên ku ji hevalên wan hatibûn bêvilê, argûşk bi ser hev de dewisandin û bi haweyê ku hema xwe biavêjin ser wan, di cihê xwe de qeliqîn.
Lê Circîs dîsa av bi êgir dakir; awir di hemiyan firand û gazî Durê kir:
«Pîrê, ma qey tu ê şîvê nede mêhfanên xwe?»
Pîrê ji zû de ji wan re şîv hazir kiribû.
«Ma çawa çawa», got û hema şîv anî.
Şîva wê tirşika petatan û girara bê şihîre bû. Sê nanên sûkê jî li ber danîbûn. Nan gezî bûbûn.
Ê bi simbêl piştî ku got «em ne hatine ku şîva we bixwin », destê xwe avêt bêrîka parkê xwe û zerfeke zer derxist.
Ne peyivî û zerf dirêjî destê Circîs kir. Circîs jî bêdilî xwe rahiştê.
«Ev çî ye lawê min?»
«Nebêje lawê min!»
«Ha, temam, temam, berxê min.»
Serê xwe hejand û di dilê xwe de kire niçe niç. Dû re jî

wilo got:
«Partiyê ji te re gondermîş kiriye, heval.»
248
Zerf qalind bû.
«Pere mere tê de ne, çî ye?»
Di bin simbêlan re beşişî:
«Na. Açmîş ke û oqomîş ke.»
«Veneke yabo, veneke!» Hesûk got û zerf ji destê wî revand.
Van ên din tevgera wî bi xwe ne xweş anî.
«Yanî çi! Bombeye, ne? Partî gava îstemîş ke, kare nehêle cîwcîwk ji we sax qurtarmîş be» û dîsa destê xwe bir pişt xwe.
Hesûk tena tena got:
«Ezbenî, em we nas nakin. Ma ne divê pêşî mirov hevdu nas bike. Belkî hûn ne zilamên partiyê bin.»
«Werê qonişmîş nebe!...»
Cidhan bi aqilê Hesûk keniya:
«Birayê min, na na, heval zilamên partiyê ne, bila dilê te rehet be. Ma ku ne zilamên wê bana, qey dikarîbûn wilo bi rehetî derbasî bin konê Circîs bûbana! Him bi haweyê partiyê rûniştine û him jî bi zarê wê bi me re dipeyivin. Zerfê veke û bide wan bila ew bixwînin bê vê partiyê dîsa çi rê daye ber me.»
Hesûk wilo kir. Wan jî dengê xwe ne kir. Ê bi simbêl bi wahc zerf vekir û hema wilo yekser dest bi xwendinê kir. Nameya ku berpirsyarê herêma Egeyê li ser emrê komîta merkezî nivîsanandibû, bi tirkî bû. Bi kurdî ba ji

xwe hîç nizanîbû bixwenda. Circîs fikirî ku nameyê pê nede xwendin. Lê aqilê wî ji rewşê nebirî. Him zarokên wî wilo xwestibûn û him ji van ên din re jî hatibû gotin ku name divabû di hizûra wan de bihata xwendin. A ku dikarîbû biqewimiya, ji dengê tirkî bêhtir wê dilê Circîs bişe-
249
witanda. Ji dilê xwe re wilo got û lê guhdarî kir.
«Circîs axayê bûblanî û xwediyê heştê hezar donim erdê Zorava, tiştê ku di vir de hatiye nivîsandin, qerara partiyê ye!»
«Lawo hîn ji serî de ne wilo ye! Bavo wilehî ez ne axa û ne jî xwediyê heştê hezar donim erd im. Temamê erdê Zorava heşt hezar donim e û ew heşt hezar donim jî li çar kesan pişk bûye. Dibê de were û kirasê xwe neçirîne, kuro!»
«Circîs axa, heger tu werê bikî, ez oqomîş nakim.»
«Na na, bixwîne bavê mino bixwîne, emrê me ji Xwedêêê!
»
«Ji wê roja ku partiya me di bin seroketiya serokê miletê kurd û rêberê temamê sosyalîzma cihanê de hatiye damezrandin, zoravî û bi taybetî jî Circîs, li cem dijminan cih girtine û dijminahiya herî mezin bi partiyê re kirine. Malê partiyê xwarine, endamên partiyê kuştine û dane kuştin...»
Circîs li kaba xwe xist:
«De îcar safî bikin, kuro ev hûn dibên çi, kuro!»
«Bihêle ez oqomîş kim!»
«Lawo ez xurîfîme guh nede devê min, bixwîne û derbas

be.»
«Her çiqasî car caran Circîs bi sebeba ku ji pare li partiyê xîne sef guhertibe û xwe mîna dilşewatekî partiyê dabe xuya kirin jî, partî ne hatiye xapandin û ew bi fihlên wî agahdar kiriye. Digel wîqasî, partiyê temamê imkanên xwe jê re berpê kirine û dîsa jî hedayet ne bûye...»
«Kuro we ev ji min re nivîsandiye yan ji xwe re? Bavo xeletiyek di vir de heye. Mirov wilo nanivîsîne.»
250
Piştî ku Cidhên got «yabo, te ewqasî di nav wê partiyê de xayintî kir û hîn jî tu hînî ziman û jîr û zanahiya partiyê ne bûye. Bihêle bila ev hevalê me ê delal bixwîne», heval dom kir:
«Circîs li gundê xwe tu carî bi dilxweşî rê nedaye partiyê, tu carî ji dil ne bûye dostê wê, tu carî xêrxwazî jê re ne xwestiye, alîkariya herî piçûk ne dayêyê û bi ser de jî qerfên xwe bi Reyis kirine. Lêbelê dîsa ew partiye ku ew ji ber agirê zilmê revandiye û li nav tirkan di gundê xwe de bi cih kiriye.
Erê, piştî vê rehma partiyê, Circîs li vir jî dîsa ne sekiniye û bi fihl û finasên xwe ên feodalî rabûye. Di vî warî de, hindik be jî, bi ser ketiye û partî di çavên hin gundiyan de piçûk xistiye...»
«Batil! Yastar!» got û di cih de qut kir.
«Circîs tifaqa gund xerab kiriye, bêşa xwe ne daye..»
«Ev jî ne wilo ye», bi dizî got.
«Sûretê Reyis û ala partiyê li mala xwe daneliqandiye. Digel ku kaset, rojname û rozetên partiyê ne kirîne, bi

zarokên xwe li bajêr ne dane firotin jî; zarokên xwe dûrî edeb û talîma partiyê kirine...»
Dengê xwe hilda:
«Erê ev wilo ye. Min tu carî ne xwestiye ku zarokên min, bi talîm û edeba partiyê rabin û rûnin.»
Xwendevên serê xwe hejand. Lê Serhên rê nedayê,
«Kalo bihêle, hevalê me ê hêja xweşik dixwîne.»
«Ji malbata wî kesek beşdarî mitîngên karkerên tirkan ne bûye, zimanê tirkî di mala xwe de qedexe kiriye û bi ser de jî di mala xwe de him xeber bi partiyê û endamên wê re kirine û him jî endam ji mala xwe avêtine..»
251
«Bavo wileh ew jî ne wilo bû!»
«Hişşş, dengê xwe nekin, mela bang dide!» Cidhên got û guh da ser bangdana mela.
Circîs qeherî.
«Ez ê nizam di çî mela, tobe ya rebî, tobe!»
«Heval heger hûn ê werê yapmîş kin, ez oqomîş nakim»
«Lawo ma hevaltî ma! Heval, ji kerema xwe re gotinên dawî bixwîne, dawî dawî», dîsa Circîs got û qurîncekek ji ruyê xwe da.
Mêrik bi a wî kir. Piştî ku bêhnekê sekinî û bi çavan hevokên dawiyê xwendin, serê xwe rakir û danî û dest pê kir:
«Ji bo selameta kurd û Kurdistanê, gelê tirk û Tirkiyê, partî gihaye wê qenahetê ku Circîs bi malbata xwe ve hema ji gund bar bike. Partî heta bi du rojan mohnetê dide

wan. Îcar heger di du rojan de bar ne kirin, partî ji felaketa
ku wê bi serê wan de bê ne berpirsyare.»
Circîs destê xwe ber bi wan de heliqand:
«Lawo yuzbaşiyê tirko ji bo barkirinê çar roj mohnet
dabûn me, ma qey partiya we bi qasî yuzbaşî jî nayê!»
Xortê piçûk bi niçe niç ji civatê re got:
«Heval ji bavê xwe re bêjin, qîma me nayê ku heqaretê
li partiya karkerên cihanê bike
Cidhan hema pê ve danî:
«Heşî bavê min, lê ew jî bêaqil e. Yuzbaşî kî ye, partî
ji Emerîkayê jî mezintir e! Dev jê berdin, çend rojek jê re
maye wê bimire, heval.»
Bêhna wan derket.
«Lê heger Circîs, bê qeyd û şert û bi her haweyî xwe û
252
malbata xwe teslîmî partiyê bike, partî dikare li ser vê
yeka han bifikire...»
Circîs bêhemdî xwe rabû ser kaban û destê xwe
hejand:
«Ê ne ez ê nebim wek we!» Rûnişt, « xortino, ji partiyê
re bibêjin ku Circîs axa ji berê jî xerabtir bûye. Û hew!»
«Baş e, em ê bêjin», gotin û hildan xwe.
3
Piştî ku ew derketin malî li hev rûniştin û li ser ku wê
çawa bikin li dora seetekê aqil dan hev. Circîs di derbarê
Izmîrê de ji Fermên hînî gelek tiştan bûbû. Li her cihê vî
bajarî miheqeq mirov wê li çend kurdên koçber rast bihata.
Ev kurd di karên herî giran û lewitî de dixebitîn. Van

kurdan qewadî, pêxwasî û li ber devê deriyên pavyon û kerxaneyan qebedayitî dikirin. Di ber pereyan de mirov dikuştin. Keç direvandin û diforitin. Pîsiya li vê dinyayê hemû dikirin. Birçî û tazî bûn. Her kes ketibû tolaqa zikê xwe û di her warî de pê li exlaqê xwe û kultura xwe kiribû. Li vir jî him ne bi hevdu re bûn û him jî dilê wan ji hev re ne xwestibû. Ber hev xerab dikirin. Li hev dixistin; di hev hildidan û hevdu dikuştin. Hin kesên ku li hev baniyabûn jî, dabûn dû Reyis. Fermên jê re wilo rave kiribû.
Mabû heyirî. Di dawiyê de hemiyan gotin kirin yek, biryara ku wê koçî Izmîrê bikin dan û di cih de Hesûk rêyî bajêr kirin.
Circîs bi devjenga Bulent û Cananê baş qeherîbû. Lê wê qehrê bi qasî qehra ji biryara partiyê lê kêrr ne kiribû. Digel qehrê tirsê jî avêtibû dilê wî. Hemû wilo bûn. Li
253
hemiyan jî wek mîha ku şivên ji nav lepên gur xelas kiribû hatibû. Bi tirs û mitale diponijîn û tevdigeriyan. Lê Dura ku hilgirtin û ragirtina malê wek çiyayekî li ser pişta xwe hîs dikir, ji her kesî bêhtir vemirîbû. Qudûmşikenandî bûbû. Te bi serê bêvilê bigirta wê ruh jê çûbaya. Li tenişta Circîs wek dîwarekî ketî vepelixîbû û habela darikê xwe di erdê dida.
Hema Hesûk ji me re qulêrekê peyde bike wê bibe çi? Em ê çawa kirya wê bidin? Ev kuflet wê çi bixwe? Ji wê roja ku em hatine vir, yekî ji me cûmek goşt bi devê xwe ne kiriye. Li bajêr mirov nikare keroşkan bi xwedî bike. Ez rûn bi haweyê ku bêhnê bide xwarinê bi kar tînim û

xwarina rij datînim ber kuflet. Ma heta kengî ez ê wilo wan bixapînim? Li bajêr em ê di ber kirîna nanê firnê re negihên. Tenûrek ji me re lazim e û li bajêr jî tenûr nabe.
Çeng bû:
«Kalo, gelo li bajêr mirov nikare nanê sêlê çêke?»
«Tew! Ez li çi difikirin û Pîrê qala çi ji min re dike. Ji zarokan bipirse, ew çêtir dizanin.»
«Ma çawa çênabe Pîrê. Lê divê tu dixanê ranekî», Cidhên got û pişt re jî hinekî beşişî.
«Ji bîr nekin ku divê em ji vir çend kevirên mezin ji bo tifikê bi xwe re bibin. Ha lawo, ma ne êzing û qirşik jî ji me re divên.»
Faro hêvî dayê:
«Pîrê ew li min, mitaleyan neke.»
«Lawo dibêjin ku li bajêr teyrik pir in û xwe di nav insanan de datînin. Ma hûn ê nikaribin hema rojê du heban bigirin?»
Serhên ziq lê nerî û bi fikar peyivî:
254
«Pîrê goştê wan teyrikan nayê xwarin.»
Pîrê sar bû, «na!» got û dîsa pirsî:
«Ma hûn ê nikaribin ji behrê masî û kêzik mêzikan jî bigirin?»
Cidhan veciniqî:
«Aha ev fikrek baş bû!»
«Miheqeq li derdora behrê niha pincar jî şîn tê, hi?»
«Aha ev ne bû Pîrê. Dora behrê hemû qûm e», dîsa Cidhên got.

Dengê terempêlekê ji nav gund dihat. Guhên xwe li dengê wê miç kirin. Qemyonek bû. Ji derdora Wêranşehîrê sê malbatên ku anîbûn dibir gundê rajorî wan. Rê di nêzîkî konê wan re derbas dibû.
«Kuro ev ne Hesûk be? Ka derkevin binerin.»
Cidhan beşişî:
«Yabo, îro du ro tu ne wek her tim î. Ez îcar hino hino ji te ditirsim. Ma çi qewimî, hema wilo zû! Ba be jî pê re nagihê. Here were qey seetek rebeno çêbûye yan na.»
Piştî ku ji kûraya kezebê axînek kişand «xebera te ye lawê min», got û xwe berda ser enîşka xwe a rastê.
Ji qerqela Pîrê xuya dikir ku ji cihê lê sekinîbû dixwest dewam bikira. Di eslê xwe de civatê jî dixwest. Pîrê di wî rûbarî re biçûya. Lê li xwe danetanîn.
«Cidhankê mino, lawo tu zilamekî araqvexwirî lê carina tu wek aliman dipeyivî. Kuro tu bi gelek tiştan dizanî. Ma bi rastî qesabên tirkan ser û pê û rovî û hûran diavêjin?
»
«Na. Ev ne wilo ye, çewt ji te re gotine. Tirk ji me bêhtir wan dixwin.»
«Lê kezeba sor diavêjin, diavêjin, hi?»
255
«Ew rast e.»
«Û rovîkên heram jî, ne?»
«Na. Tirk wan ji goşt jî bêhtir dixwin. Li nav bajêr li ser erebokên bi menqêl dibrêjin û ji mirov re dixin nav nên.»
«Baş e, çi dikin ji hestiyên dewaran?»

Bi Circîs zor hat:
«Eeehew Pîrê! Keçê berê kelbetên devê te venedikir,
ev çi bi te hatiye!»
Bi bilindkirina destên wê re hûçikên kirês xwe berdan.
Li xwe hayî nebû. Bûbûya jî tiştek ne dikir.
«Erêê! Ma me berê hêsîriyek bi vê ecêbê dîtibû, Kalooo!
Xwedê totilmekê li ser dilê mezinê wan xe ku rebî av
negihê ser! Ma çî me tune bû! Ma em kêmî çi bûn! Rişk û
sipiyan mîna xweliyê girtine cilên me û em nikarin qutiyeke
derman ji xwe re bikirin, te serê min xwaro, looo!»
Ew zendên wê ên ku dişibiyan qarotên kelbeşê, heta ku
ne peyivîbû jî bi ronahiya çirayê re direqisîn, lê du re mîna
pelên çilo ricifîn û bi ricfa xwe re hêdî hêdî tewiyan.
«Xwedê ji sersebeban re nehêle!»
Circîs bi destê wê girt:
«Dev ji sersebeban berde, em wan nas dikin. Lê wê
dawî çawa bibe? Wê ji me re bibêje, serê xwe li ser wê
biêşîne Pîrê.»
Wê nifir û gilî û gazinên xwe domandin:
«Xwedê heft topên ezmanan li mala wan xîne! Ma em
ên ku wilo li serê me bihata!...»
Circîs di van kêlîkan de bi her haweyî dîsa xwe têkçûyî
didît. Nema dizanîbû bê wê çawa bûba û bê zerar yan jî bi
zerareke hindik ji nav derketa. Dan û stendina partiyê û
256
exlaqê wê her tim ne ecibandibû û xof jê girtibû. Lê tu carî
ne bi qasî ji roja ku li vî gundî rûniştibû. Li gora wî temamê
qeweta partiyê di destê Reyis de civiyabû; Reyis ew

qewet bi fen li Kurdistanê li himberî kurdan heta bi dawiyê bi kar anîbû û kurd têk biribûn. Û vê carê jî berê xwe dabû kurdên li Tirkiyê. Karê wî li vir rehettir bû, ji ber ku kurd di nav tirkan de bi qasî çengek ax bûn û tirk jî di pişt perdeyê de hevalê wî bûn. Li Kurdistanê ba dikarîbû bûba pîber, lê li Tirkiyê ew jî bi dest ne diket. Heger koçî bajarekî wek Wanê kiribûya û li wir qîma xwe bi parsê anîbûya, pars bi dest diket. Lê li Izmîrê him ji wê jî bûbû û him jî pereyên heqrêya vegerê pê re ne mabûn. Wilo difikirî, xwe bi tenê didît û ji ber wê yekê jî tam ji desthilanîn ketibû.

«Min hûn petixandin! Çi bi serê we hatibe ez sebebim », ji nişkê ve got û hêsirên xwe paqij kirin.

Cidhan gava ku bavê xwe di tengayê de didît, dizanîbû ku divabû ji bavê xwe bi aqiltir bipeyivya da dilê bavê bi gotinên wî fireh bûbûya. Da aqilê xwe, li tesîra têgehan fikirî û got:

«Bi milyonan kurmanc ji cih û warê xwe bûne. Ma tu sebebê wan e jî? Na yabo. Hinan li miletê me şapek rakir û em jî ketin ber wê şapê. Li me kurmancan gelek gelek caran şapên wilo rabûne û derbas bûne. Ev ê jî derbas bibe, guh nedê yabo, Xwedê xefûr û kerîm e.»

«Lê tu şap ji wan jî wek vê şapê ne bû, lawo!»

«Qey ji ber ku ev a dawî ye, wilo dijwar e, yabo!»

«Ez bawer dikim. Ji xwe ji ber wê yekê ye ku hema gêr dibe û naçe.»

«Yabo min fêhm ne kir.»

«Ev hevîr wê hîn pir avê bikişîne, lawê min.»
«Çawa yanî?»
«Lawo, dixwazin me kurmancan bi carekê ve biqedînin. Yan jî bi qasî ku kurmanc wê nikaribin pîşta xwe bitewînin, ji derb bixin», got û bi teqîna bin kon re qêriya: «Ha wilo ha, ha ha! De berdênê, berdênê! Bikujin, cahşan, çêlîkan, hema hemiyan bikujin! Ê ne ez beraz im, beraz! Kuro ma ez ew ê ku teslîm bibim, haaa!...»
Bi teqînê û dû re jî bi hingama Circîs re, çelq li her kesî ket û wey li wî ku xwe bigihanda derve. Li hev qelibîn û serserkî kişiyan. Di wê navê re lawê Faro jî di qorziya kon de xwe di erdê dida û giriyekî pîs dikir. Dereng pê hisiyan ku balona lêwik teqiyabû.
«Tew emir qesifyo hîn digrî jî. Ê ne careke din ez wan nepoxan li vê malê nebînim. Li ên mayî bigerin û wan jî biavêjin.»
Cidhan bi devlikenî:
«Yabo na na, baştir bû. Ma ku ne ji nepoxê ba, wê kê ji me bîra nobetê bibira. Ji dêvla ku tu zarokan xelat bikî, îcar tu...»
Veciniqî:
«Wey! Bi Êlim tu rast dibêjî. Me bîr ne biribû. Dikarin çend bimbeyan biavêjin nav me. Hi, li aqilê min be! Tu carî wê wek niha nikaribin keysê li me hemiyan bînin. Divabû me hîn ji roja pêşî de ev kiriba.»
«Lêbelê polîs jî dikarin bimbeyan biavêjin nav me. Li gelek cihan gelek caran, polîs û tîman ji van zirt û pirtên wan cesaret girtine û bimbe avêtine malên xelkê. Û dû re

jî ketiye stuyê wan.»
«Wilo ye lawê min, gotina te bi serê xwe ye...»
258
4
Hesûk seet li derdora yazdehê şevê bi texsiyekê hat. Texsî ji kon hinekî dûr sekinand; bi lez daket û bi lez jî alavên xwe ji texsiyê danîn. Salihê nobedar pê ve bazda. Lê wî guh nedayê, alav jê re hiştin û lezand. Bêserî kişiya bin kon û di nav koma zarokan de çong berdan erdê:
«Pîrê, Nesîma, Besê, zarokan şiyar bikin û vî şîrî bidin wan.»
Pîrê pê ve hat:
«Dev ji wan berde, sibehê jî dikarin vexwin.»
Wî bi a Cidhên kir. Zarok hemû şiyar kirin û çi şîrê ku di galon de hebû, bi carekê ve li wan belav kir.
Hesûk hilkişiyabû Kadîfekaleyê qehwa omeriyan û bi çend kesên nas re rûniştibû. Ji serî heta binî rewşa xwe a li gund ji wan re bi darvekiribû û xwe avêtibû dexl û bextê wan. Bi tenê yek li ber barê wî rabûbû. Lê ên din jî ew destvala bernedabûn: Jê re çewalek nan, çar lître şîr, pênc kîlo şekirê hûr, du kîlo çayê, pênc mirîşkên biraştî û gelek tiştên wek van kirîbûn. Û heqê texsiya wî jî dabûn.
Hesûk piştî ku got «malîno, ji me re çayeke giran li êgir bikin» û bê mane li ser pêyan bêhnekê sekinî, Circîs peyivî:
«Bavo em xwe nema digrin, de ka were rûne û bibêje bê te çawa kir?»
«Baş bû, baş. Omeriyên me camêr derketin, kêmanî ne

xistênê. Tiştê ku ji dest wan hat ji bo min kirin...»
Circîs beşişî:
«Li welatê xwe diz, pêxwas û korfesend be û li nav tirkan jî bibe camêr. Hûn dibînin bê em kurmanc miletekî
259
çawa ne, ne wilo?»
Hesûkê ku ne li bendî gotineke wilo bû dilşikestî û gazinokî peyivî:
«Yabo ne sar li te tê û ne jî germ li te tê. Em bi te re mane heyirî. Lawên bavan alî me nekin dibin korfesend, bikin dibin qirdik. Ê de ka em çi bikin!»
«Kuro ehmeq ez tiştekî din dibêjim. Hişê xwe tam bidin ser gotinên min. Ev Circîs êdî ne ew Circîsê çilpêncî sal berê ye. Pevçûnê bi carekê ve ez kirime aqil.
Aqil ji min diherike. Ji aqilê min hinekî ji xwe re bigrin. Mirovê dema ku mîna min bi pevçûnê xwe da bin barê jînê û ji desthilanîn neket, zana dibe.» Li Durê nerî û domand; «kuro ma vî kevjalê bavê we qey hindikî li ber xwe daye. Ma qey ez hindik bûm, hindik! Ma ne wilo bû Durê?»
«Ma çawa ne wilo bû, Kalo. Lê de ka bihêlê bila bibêje bê hewşa xaniyê ku peyde kiriye çawa ye.»
«Xanî ne tu xanî ye, lê ji tunebûnê çêtir e. Ax ku hema piçekî jî mezin bûya. Odeyên wî mîna kewarên mêşên zirahetê ne. Xanî hemû odeyeke û ew ode jî bi textikan kirine çar ode. Hema ez nizanim her derê xênî bi textik û mextikan rapêçane.»
Durê ji nişkê ve:

«Erê lawê min hewşa wî?»
«Hewşa çi!»
Behetî got:
«Xanî û bê hewş ha! Ma dibe! Ev çûna me a Izmîrkê mizmîrkê ne ket serê min. Hîn ji serî de her tişt ji hevdeketî xuya dike. Kalo tu bi a min bikî, em cihkê xwe bernedin wê baştir be.»
260
Hesûk xwe aciz kir:
«Em bi a te nakin û em ê ji vir herin...»
Circîs bi ser hilbû:
«Bi Pîrê re wilo nepeyive. Ez dizanim bê ew çi dibêje. Me daye ser şopeke wilo kesnedîtî ku em her tim dikarin ji ber hev bikevin û bi ser rêyên xerab de biterqin. Lawê min birçîbûn zor e. Tiştek nikare rê li ber birçîbûnê bigire. Birçîbûn felaketa herî mezin bi serê mirov de tîne! Pîrê vê dibêje. Fêhm bike.»
«Na yabo, na, hîç mitaleyan neke, kesek ji me dev ji kesî bernade û nakeve tu rêyên xerab. Bi saya serê partiyê her kesî rêyên xerab nas kirine...»
Cidhan gotina wî birî û bi ax û keser peyivî:
«Her derê xênî niha tije bey û bizûz in jî, ma ne? Em mezin belkî bikaribin xwe li ber wan bigirin, lê wê zarok çawa bikin gelo? Bizûz dikevin guhên zarokan; perda guh qul dikin û diçin ser mejî. Di qulên bêvilê re derbasî ser kezebê dibin û hinavan dixwin. Çavan kwîr dikin. Şûna gezên wan dibe bîrov û bîrov jî ha ha li lêş vedide. Û heger bîrovê avêt serî, wî çaxî jî mirov keçel dibe. Na na, ew ne

tu xanî ye, wê zarok hemû bimirin...»
Di vê navê re dayikên zarokan jî guhên xwe bi ser de bel kiribûn û bi dizîka hêsir dibarandin.
«Bavo bes e, te em hemû bi girî vekirin, weh!» Circîs got û gotina xwe bi Serhanê ku ji wan hinekî dûr rûniştibû re domand:
«Lawê bavê min, de ka tu jî biqedime nav me û çend gotinên xwe ên xêrê ji civatê re bibêje. Di rojên teng de her kes divê a di dilê xwe de bibêje. Aqil ji aqilan çêtir heye.»
261
Xeberdana Serhên wek zarokên ku mizgîniya tiştekî dianîn, gotineke-dudu digotin, xelata mizgîniya xwe distendin û hema ji ber çavan winda dibûn, ewqasî kurt bû. Dîsa kurt peyivî:
«Mana li vî gundî ji me re naserife. Em mecbûrê çûnê ne. Kalo, ez wilo difikirim.»
«Tu baş difikirî. Cidhên jî xweşik got. Di eslê xwe de em hemû wek hev difikirin. Hebûn ji nebûnê û nexweşî jî ji mirinê çêtir e. Gava em li vir bimînin, wê hinekan ji me bikujin û em ê ji hev belav bibin. Bila bi devlêkirina bizûzan û nexweşiyê be û ne bi tefandina çira mala min be. Em ê herin. Lê xwezîka ev çûna me ne Izmîrê, Wanê û yan jî bajarekî welatê me bûya.»
Cidhên da ber û tewirand:
«Hoooweh li vê ecêbê! Xelk ji ser ruyê dinyayê dikarin biçin heta bi ser heyvê û em jî nikarin biçin heta bi Wanê, kuro! Xelk li çûna xwe a ser heyvê tirilyon dolaran

didin û em jî li heqê rêya xwe a Izmîrê dimînin heyirî, haho! Wileh ev ne tu edalet e, bavo!»
Hesûk bi destê wî girt û hejand:
«Cidhan, na na na, a dawî nebêje. Di nav me de heger yekî ku piçek misilmanî pê re mabe, ew jî tu yî. Kufir nebe û rêya xwe dewam bike. Ji mirina te re hindik maye. Li wê dinyayê ji me re ebûkatek lazim e; ebûkatekî ku bi textê wî bigre û bihejîne, lazim e. Û ebûkatê vê malbatê jî tuyî. Ê li jor nikare ebûkatiya te qebûl neke. Ez ji te bi salekê mezintir im, lê dîsa jî bila ez xulamê te bim, nav xwe û wî xerab neke; mahneya wî nexêyê...»
262
5
Circîs bi maliyan re heta derengî şevê wenisî. Piştî ku nobet girt ser xwe û heta bi Durê jî xist xew, bi dizî xwe gihand xirbekê dostê xwe Fermên û ew ji nav livînan rakir. Wek du gurên pîr dan dû hev û li binya kon çong berdan erdê. Circîs di van kêlîkan de mîna xwendekarê ku ji metematîkê wê imtîhan bûbûya, ha ha dirikrikî. Tirsa wî a vê carê jî ji ber qewlikê wî ê vala bû. Hesûk bi ro hilat re wê qemyon bianiya û temamê pereyên ku li ser hebûn berdabûn bêrîka xwe.
«Em sibehê ji vir bar dikin Izmîrê, ma tu ji vê yekê re çi dibêjî? Em baş dikin, xerab dikin? Destê min di nava min de ye. Beleyên mezin li pêşiya me ne! Ma tu dibê wê partî bela xwe ji me veneke?»
Circîs carina dibû wek palevanên ku ji taştê ne razî bûn û dilê xwe bi firavînê xweş dikirin. Him partî dijminê xwe

didît, henekê xwe bi aqilê wê dikir û him jî hêviya qenciyê jê dikir.
«Çûna wir jî ne xelasî ye. Lêbelê dîsa jî ji sekina we a li vir çêtir e. Partî wê xwe ji ser pişta we venekişîne; wê serê we rehet nehêle û bi her haweyî bi we dakeve. Û polîs jî.»
«Rast e, lê wê nikaribin tiştekî bikin.»
«Ez wek te nafikirim. Xwezîka wek te ba. Lê na dosto. Ez bawer nakim ku tu ê karibî keç û xortên xwe li hev ragirî û wan bi destên partiyê ve bernedî.»
«Keç û xortên min bi qasî min partiyê xerab nas dikin. Û bi ser de jî hemû şîretkirî ne. Di vî warî de ez ji wan piştrast im.»
263
«Lê li vir dîsa jî fêde nake. Xerabî wek qenciyê li xwe dike, bi mirov re rûdine û destê xwe li ser serê mirov digerîne. Tu ji min çêtir zanî ku feqîrî dest û lingên mirov girêdide. Û partî jî vê yeka han baş bi kar tîne. Fenên wan bi qasî mûyên rîha min û te pir in. Ew rêyekê dibînin û dikevin bin kufletê te. Pir rehet e. Li vî welatî gava wan a pêşî, bêrîka keç û xortan tije pere dikin. Cilan ji wan re dikirin. Wan dikin mezin û terempêlan dixin bin wan. Gava duduyan, îcar bi her haweyî wan ji malê qut dikin û berê wan didin kar û barê pevçûna bi polîsan re. Gava sisêyan, wan dikin mehkûmê dewletê û vê carê jî her tiştî ji dest wan digrin. Gava çaran, îcar berê wan didin Yûnanê û ji wir jî didin newala Nesarayê. Gava pêncan...»
Circîs bi destê wî girt û devê xwe bihustekê ji hev

vekir:
«Eeehew! Te deriyê min li deriyan gerand, bavê mino!
Te qiyamet bi min de anî! Lê tu rast jî dibêjî.»
«De ka bihêle ez temam bikim. Ez li gava çendan
mabûm?»
Xwe aciztir kir û herdu destên xwe ber pê de heliqandin:
«Ez çi zanim!» Û hema pê re jî, «heger ez ne şaş bim,
te heta bi gava heftan jî biribû.»
Ferman jî piştî ku got «ez dibêm ez li gava pêncan
sekinîbûm» û ji wir dewam kir:
«Li newala Nesarayê çend mehekî Reyis û birêvebirên
partiyê, wan li gora xwe bi terbiye dikin û dû re jî wan
dişînin çiyê. Û ji çiyê jî veger tuneye. Partî li vir vê siyasetê
dimeşîne. Û bi ser jî ketiye. Ev li dora sê-çar salan e
ku ji koçberên li Tirkiyê ha ha keç û xortan dikişîne nav
264
xwe û bi qeweta wan, xwe li çiyê li ser lingan girtiye. Li
gora ku tê gotin, li Ewrupayê jî bi eynî karî rabûye. Ewrupa
jê re bûye dengiz.»
«Baş e, de ka em çawa bikin?»
«Ji bo keçan a herî baş bi haweyekî divê tu wan bizewicînî.
»
«Ez ji zû de li vê fikirîme. Lê de kanîn ew mêr? Qira
xortan anîn!»
«Wan bi nav kolanên bajêr de hinekî serbest berde. Ew
ê ji xwe re bibînin. Ew jî wek partiyê karê xwe baş zanin.
Li Kadîfekaleyê gelek qehwe hene. Bila rojê du caran di
ber qehweyan re herin û werin. Lê eman bila nebe sê-çar

car! Mêr dû re karin çewt fêhm bikin.»
«Li wan qehweyan tirk yan kurmanc rûdinin?»
«Na na, hemû jî kurmanc in. Li Qelê ji kurmancan pê ve kes rûnanê. Ji wî alî de bila dilê te rehet be. Ha ha, dîsa li wan deran, çend cihên ku xort lê bi gokê dilîzin jî hene. Bila keçik car carê li wir jî xuyanî bikin.»
«Ma qey hîç di nav wan xortan de xortekî tirk tuneye?»
«Lo hema ku wî xortê tirk, ew keçên te ên sipehî, ji nav lepên ên me derxist, wey xweş helal be lê!»
«Ew jî xebera te ye.»
«Û ji bo xortên te jî...»
«Dev ji xortan berde, serê xwe bi wan neêşîne. Çi bi wan tê bila bê, bi ku de dirin bila herin. Ew zilam in. Û namûsa zilêm jî ne di nav şeqên wî de ye, ma ne ji xwe.»
«Ez ê a xwe bêjim û di pey re jî tu û bi kêfa xwe», got û guhikê çakêtê xwe bilind kir.
Piştî ku bi dizîka çixareya xwe pêxist û çixare di kefa destê xwe de veşart, keserek kişand û serê xwe berda ber
265
xwe. Bi vî haweyî bêhnekê ponijî. Dû re serê xwe bilind kir û li ezmên nerî. Her der pêketîbû. Lê ronahiya bajarê Izmîrê, mîna rivîna sersotan di zikê ezmên de gihabû hev û stêran sipehî xuya ne dikirin. Li gund qet tiştekî pêketî tune bû. Car carê şewqa terempêlên ku ji jêr ber bi jor ve diçûn bajêr, wek babîsokê li ser gund dilîst û hema pê re jî winda dibû. Sirûşt jî mîna gund vemirîbû. Ji tu malê ne dengê giriyê zarokekî û ne jî pêjina civanê evîndaran dihat. Bi tenê dengê bajêr dihat. Ew jî mîna trêna soqyatê

diket guhên Circîs, ewqas. Wî jî mîna ê din serê xwe rakiribû
û ji kûr û dûr difikirî. Bi dilê Fermên re hinavên wî jî
bi carekê ve dikeliyan. Fermana ku lê rabûbû, Fermana
Filehan û herdu zarokên ku ji ber fermanê reviyabûn di
bîra wî de anîbûn. Bêyî ku bi xwe bizanibin mîna herdu
zarokên ku xwe gihandibûn şikeftên rajorî gundê Kertwênê
û gundiyan jî ew di wir de hêsîr kiribûn, xwe li hev
pêçabûn. Lê ew di wê rewşê de miribûn û ev ên din jî hîn
bi ruh bûn. Çavên wan ziwa, ên van şil bûn. Keçik nehdeh
salî, lawik deh-duwazdeh salî bû û ev jî gihabûn dawiya
emrê xwe.
«Aha ev e insan!» Circîs qêriya, destê xwe li erdê xist
û dom kir:
«Ez ji berê de ew bavê xezebê bûm! Ên ku ew herdu
zarok di wir de ji tî û birçîna kuştin, min jî serê wan ji hev
belav kir. Ê ne ez ê teslîm nebim!» û rabû ser xwe.
Fermên ew hişk zeft kir:
«Bavo em ne di şerê kozik û çeperan de ne, hişê xwe
bîne serê xwe, halo nabe, heyra! Derdora me tije beredayî
ne, wan bi me şiyar neke...»
Circîs bi a wî kir û devgirtî rûnişt. Fermên piştî ku bi
266
haweyê berê çixareyeke din pêxist û sê-çar hilm li ser hev
kişandin, dîsa ji ilmê xwe peyivî:
«Pevçûna li ser miqedesatan îmanperwerî ye. Û axa
bav û kalan jî miqedesata herî mezin e. Helbet em ê li ser
mala xwe biviritînin. Û me viritandî ye jî. Lê divê mirov
ahlê wê be û zanibe heq jê dekeve. Em heq jê derneketin.

Lê divê ev neyê maneya ku em ê heta bi heta heq jê dernekevin.
Tu li ber xwe didî û tu bi neheqiyê re şer dikî. Ev
pir baş e. Lê tu di binê newalê de gurzê xwe dihejînî. Bide
kêş û ji kêş di wan werke.»
«Yanî ez bidim nav partiyê, ha! Tu ji min re vê dibêjî?»
«Ew jî şiklekî pevçûnê ye, ezbenî. Dev ji haweyê Serdarê
xwe berde û bi haweyê Reşoyê xwe tevbigire...»
Nehişt dawiyê li gotina xwe bîne. Destê xwe hejand û
bi hêrs got:
«Reşo jî tu gû belav ne kir!»
Fermanê ku Reşo ji mala wî qut ne dibû û bi qasî lawekî
xwe jê hez dikir, xwe jê aciztir kir:
«Ez qebûl nakim, halo mepeyive, ez xulam!» Circîs
hema pê re sist bû. Carekê din jî wilo gotibû. Hindik mabû
ku Fermên cewaba wî bida. «Reşo kurdekî mezin bû!
Mezinekî halo ku karîbû bi kesên ne wek xwe re bida û
bistenda û bimeşiya. Bi tenê xeteyek kir û bi wê xeteyê jî
têk çû. Û heta em hemû û temamê kurmancan jî cezeyê wê
xeta wî dikişînin. Dema ku mêrik nas kir, gerek kuştiba.
Gerek bi a Mencê û Serdêr kiriba. Wek wî lêxîne. Him tu
ê imkanan bi destxînî û him jî tu ê bi dostayî karibî li xayinên
di nav partiyê de xînî. Tu pê ne gunehkar û ne jî piçûk
dibî. Berberî halo ye. Bav û kalên me halo gotine, ‘ mirov
di rojên teng de ji yarê dêya xwe re xalo dibêje. Ji wan re
267
apo jî bêje! Wek Reşo, Reşo, cihê herî bilind bide camêran
û li hêla din jî xwe li ber dilê sîxuran şêrîn bike û wan biavêje
hindurê hêtûnan. Binere êz ê ji te re bêjim bê min çi

kiriye», got û keysa xwe xweş kir:
«Dema ku ez hatim vir, min xwe xist kirasê wan û wan
çi got min bi a wan kir.»
Circîs di ber xwe de:
«Tew!»
«De ka dev ji van tew û mewan berde û bihêle ez
bêjim, heyra!»
«Bibêje ez xulam, ez li te guhdarî dikim.»
«Ma te zanîbû ku ez jî li ber deriyên mizgeftan destên
xwe vedigirim?»
Circîs gotina wî bi xwe tahl û zor anî. Lê wekî din got:
«Na. Lê xem nake, ne tiştekî ecêb e. Em him hêsîr û
him jî birçî ne. Ji bo me pars ne eyb e.»
«Îcar heger min bi a wan ne kiriba, min ê jî bi vî halkê
xwe, mîna wî bêmiradê Reşo, bi dostayî nikarîba mezinên
wan bikuştana. Em ê hîn gelek ên din bikujim.»
Vî pîremêrî digel çend hevalên wek xwe, bi metodin
wilo derb li berpirsyarên komîteyên partiyê, dezgahên wê
û herwekî din dixistin ku aqilê mirov disekinî. Li gora wî
û hevalên wî ên torî, partî bi qeweta toriyan bi hêz û mêz
bûbû û dû re jî bûbû dijminê miletê kurd. Di vî warî de torî
ji her kesî bêhtir sûcdar bûn û divabû sûcê xwe sivik kiribana.
Ji berpirsyaran pê ve jî kes ne dikuştin. Li gora wan,
berpirsyar bûbûn «minafiq» û kuştina minafiqan jî gunehê
wan ê giran, li ba Xwedê zû sivik dikir.
«Ih, niha tu jî ji vê re berberî dibêjî; û kuştina bi
dostayî ha!»

Fermên xwe aciz kir, rabû ser xwe û li ser pêyan got:
«Heta ku tu xwediyê xwe û vî aqilî be, wê yeka te nebe dudu.»
Piştî ku Circîs jî rabû ser pêyan, ew rûnişt. Lê Circîs rûnenişt; xwe bi ser de daqûl kir û bi dizîka got:
«Mirov ji bo ku derbê li dijminê xwe xîne, jina xwe jê re pêşkêş nake.»
«Lê gava dijminê te xurt be, wê him te bikuje û him jî jinê ji xwe re bibe. Cihûyan di şerê himberî ereban de, hindik keç û jinên xwe pêşkêşî ereban ne kirin. Wan, ew namûsa ku te xwe pê girtiye, di zeftkirina erdan de bi kar anîn û welatek bi dest xistin.»
«Ez jî bi rê de wek te fikirîbûm. Lê...»
«Lê çi? Çi hat guhertin ku te dev ji wê fikara xwe berda?» Fermên dengê xwe hilda û got.
Circîsê ku di wextekî de ji bo pîskirina Heso, li himberî çawîşê Stilîlê qîma xwe bi temamê pîsitiya dinyayê dianî, gotina dawî got:
«Di berberiya te de exlaq tuneye, ezbenî.»
Fermên hema bersiva wî da:
«Di berberiyê bi xwe de exlaq tuneye, ez xulam.»
«Berberî pevçûn e, pevçûn serhildan e û serhildan jî parastina miqedesatan û tişt û miştan e.»
Ferman rabû û rûnişt û liblibî got:
«Te nîvê wê got. Berberî siyaset e. Siyaset pevçûn e. Pevçûn pere û imkan in. Pere û imkan jî desthilatdarî ye.»
Circîs piştî ku hinekî ponijî, dilê xwe xeland:
«Mirov nikare wek te bike, nabe nabe!»

«Tişt ji tiştan mezintir hene. Îcar mirov divê zanibe pê
li hin tiştan bike da karibe bigihê wan tiştên mezin. Bine-
269
re bê wî Reşoyê te çawa kiribû, baş guhdarî bike:
Gava ku Resûlê çekdar, Heso û temamê gundiyên te li
ser bênderan civandibûn û li wan dixist, Reşo jî wî çaxî di
xeşîma bin xirbekên Kenêr de bû û li hemiyan dinerî.
Resûl li Sarê dixist. Sarê ji Reşo hewar dixwest û bi dilşewatî
diavêt ser xwe û wî. Deng diçû Reşo û deng jê dernediket.
Piştî wê, Resûl cercûrê keleşkofa xwe di devê Kenêr
de vala kir, lê Reşo dîsa bi wan ve ne çû. Îcar çima ne çû?
Di şerê bi wan re, wê bihata kuştin. Û kuştina wî a bi wî
haweyî, tu fêde wê ne daba miletê kurmanc. Çû xwe li ba
mêrik da kuştin. Û bi kuştina xwe dawiya wî anî.»
Circîs dîsa bi zirt got:
«Dawiya çi birayê min! Mêrik ji doh xurttir bûye, ma
derewe qey.»
«Na, na, tu şaş î. Zilamekî bi du qurûşan li dor ne
maye. Her tişt bi devê tivingê û pereyan dimeşe. Û tiving
û pere jî di destên pêxwas, solalês û nemerdan de, demeke
kurt diçe, ewqas.»
Circîs dîsa hat ser gotina xwe a pêşî:
«De ka bide ser hev, ma tu dibêjî em çawa bikin?»
«Çi çawa! Wek Reşo bike; kêfa xwe ji wan re bîne», bi
bêhntengî got.
«Ya hewlelwela, ya rebî tu çêkî!»
«Ma qey kêfa Berzaniyê ku bi şev û roj di nav pêşmergeyan
de li vî şerî û li wî şerî bû, ji jinan re dihat ku ji her

eşîrekê jinek anî bû? Na. Imperetoran bi wî haweyî kirine
û bûne xwediyê dinyayê. Siltanan birayên xwe û heta
lawên xwe kuştine. Xelîfeyên islamê bi bêbextî qira hevdu
anîne. Lê heger halo ne kiribana, tu zanî bê wê çawa
bûba? Ne imperetorî karîbû bidomiya û ne jî vê islama ku
270
em petixandine, wê karîba li dinyayê ewqasî belav
bûbûya. »
«Wilo ha!»
Fermên dengê xwe bilind kir:
«Wilo ye û halo ye; hek! Xêr li rêya te be», got û ber
bi mala xwe de lezand.
«Na na!...»
Fêde ne kir. Ferman nesekinî. Lê Circîs jî heta ku ew
ne gihand devê deriyê wî, ji dû venebû. Piştî ku Circîs
berê xwe da bin konê xwe, vê carê jî Fermên da dû. Circîs
li tenişta kon rawestiya û li dostê xwe nerî. Dostê wî jî
bêyî ku tiştekî bibêje, paş de vegeriya. Circîs dîsa da dû û
heta ku gihan ber mala Fermên yek ji wan jî ne peyivî. Lê
piştî ku Circîs paş de vegeriya û Fermên jî dîsa da dû, Circîs
bêhna xwe teng kir, dengê xwe hilda û got:
«Bavo wilo nabe, weh! Ez ê te bigihînim mala te û
vegerim û tu ê jî min bigihîne mala min û vegere...»
Ne dixwestin hevdu bi tenê berdana. Di dawiyê de li
hev kirin. Li cihê xwe ê berê vegeriyan û heta ku ronahî
ket dinyayê bi hev re rûniştin.
6
Hesûk bi ro hilat re xwe pevxist û berê xwe da bajêr.

Çûn û hatina wî hemû jî seet û nîvek ne girt û bi qemyoneke bozing vegeriya. Şifêrê qemyonê kurdekî serhedî bû. Heqê barê wî divabû nod ya jî sed milyon ba. Lê wî qencî pê kiribû û bi sîh milyonî xwe dabû ber bêr.
Bi hatina qemyonê re gundî komik bi komik li ber dîwaran civiyan û ji dûr ve li koçê temaşe kirin. Ji bilî
271
zarokan, ne yek ji wan ji ber xwe ve bi vir de hat û ne jî van bangî yekî ji wan kir. Lê ji çixareya ku li ser hev dikişandin, xuya dikir ku dilê hemiyan jî bi ser van vebû. Hin pîrekan jî bi dizî hêsirên xwe paqij dikirin.
Jin û mêran piştî ku mal di hilm û pifekê de avêtin hindurê qemyonê, Circîs Durê da tenişt xwe:
«Binere li qemyonê siwarên û dengê xwe nekin» û berê xwe dan nav komikên pîrek û zilaman.
Lê çawa ku ber bi komikan de meşiyan, komik jî ji ber wan wilo qûna qûna bûn û bi vir de û wir de belav bûn. Yekî jî li paş xwe ne dinerî. Circîs ew fêhm dikirin. Dizanîbû ku wî wek Tecêl nabînin. Xwe ne kir wek wan. Digel ku ji dûr ve xatir ji hemiyan xwest û kesî bersiva wî neda, dîsa jî xwe aciz ne kir. Lêbelê Durê li ber xwe ket û kela girî kete qirikê. Piştî ku çend carekî li kabên xwe xist û rûnişt, bi hêrs rabû ser xwe û berê xwe da qemyonê. Circîs neda dû; li gasînê sekinî, fikirî û da aqilê xwe:
Ma dibe ku ez xêtir ji dostê xwe ê herî ezîz nexwazim û bi rê bikevim? Na. Di kurmanciya me de tiştên wilo eyb e. Lê bi vî xatirî dikarin beleyekê bînin serê mêrik. Ma ne wilo ye? Belê. Ma wê ji ber xwe fedî bikin? Na. Ez herim

ez nerim, gelo kîjan baş e? Gava ku ez xwe negihînimê, ew ê ji min re çi bibêje gelo? Wê kêfa xwe bîne. Na na! Ew jî mîna te kurmanc e. Na, ew kurmancekî ecêb e! Ma ne ji tirsa wan xwe ji mala min vegirtibû.
«Hema çi dikin jê bila bikin, ez ê herim wî bibînim», got û bi wir de lezand.
Piştî bêhnekê sekinî:
«Mêrikan çere mere nizanin. Tê nabihurin. Circîso vegere! Te mala xwe xerab kiriye, îcar a xelkê bi xwe re
272
xerab neke!»
Keniya û destê xwe jî pê re hejad:
«Tew, tew, mala çi kuro! Hindur bi qurbana ji derve be...»
Neket serê wî. Lezand û çû. Lê piştî ku gasînek li dû xwe hişt û dageriya ser gasîna ku diçû mala Fermên, dîsa sekinî û mîna hêlanê çû û hat:
«Îcar niha ku di ruyê min de, derbekê li vî camêrî bixin ez ê çawa bikim?»
Dilê wî sivik lêxist û li ber dîwêr rûnişt. Qederekî ponijî. Di dawiyê de:
«Ez ê heyfa wî jî hilînim», bi hêrs got û çengî wê navê bû.
Lê bi çengkirinê re vê carê jî eniya xwe li dîwêr xist. Li dora xwe nerî. Xortek bi lez ji wir ve dihat. Piştî ku xorto ew derbas kir, di taldeya dîwêr de rûnişt; hişk bi eniya xwe girt û bi hêdîka qêriya:
«Aaay yabooo!»

Heger eniya wî şikestibûya dibû ku ewqasî ne êşiyaba.
Enî hema pê re bi qasî xarekê werimîbû. Bi a kurmanciya
xwe kir û çû. Fermanê ku malê xwe baş nas dikir jî, hîn ji
serî de, di devê rêya wî de xwe dabû ber tenişta dîwarekî
û li bendî sekinîbû.
«Circîs Circîs, bes bi wir de here! Were vir, em bûne
beraz, beraz, xwe li min berazî bigire, bigire!...»
Circîs nehişî xwe avêt himbêza wî û xwe li hev
rapêçan.
«Em ji hev re lazim in; divê hayê me ji hev hebe», Fermên
got û xwe hîn bêhtir lê rapêçand.
«Erê. Lê ma em ê çawa karibin ilm ji hev hilînin?»
273
«Ew rehet e. Ji min re bihêle.»
«Yanî niha cihê ku em dirênê, tu nas dikî?»
«Ez jî bavê xezebê me, ma cihekî ku li vê herêmê ez
nas nekim maye qey! Argûşkan bi ser hev de bişidîne Circîs.
Mêranî û camêriya herî mezin di rojên teng de ye.
Binere emanet, emanet, bila hayê te ji keç û xortên te
hebe. Her yek ji wan li himberî tabûrekê ye. Ew ji me re
lazim in.»
«Kuro mirov ji te ditirse. Ev tu çi dibêjî?»
«Netirse, yek ji wan jî ne himberî me ye. Pevçûn!
Xwîna mencêyan, serdar û reşoyan divê li erdê nemîne. Û
xwîna Sarê, Erol û Kenêr jî! Minafiq efû nabin, nabin!
Xwîn bixwînê! Xwîna paqij bi a lewitî, lewitî! Em kurmanc
in û ji bo kurmancan û ew jî tirk in û ji bo tirkan
heşkere heşkere dikin. Ew tirkên ku xwe di nav me de wek

kurmancan girêdane!...»
Bi vî haweyî li dora du-sê deqîqeyan bi hev re peyivîn. Piştî ku sê-çar caran ruyê hev maçî kirin, wek du dîkên ku pevbiçin û rovî di ber wan re derkeve, ji nişkê ve ji hev qetiyan û yek bi vî alî û yek bi wî alî de reviya.
274
BEŞÊ DUWAZDEHAN
1
Bizûzan mîna ku Cidhên rave kiribû, zarok ji derb xistin. Mezin jî pir êşandin. Di vî xaniyê ku ji bo wan bûbû êşkenceya herî mezin de, man û man û bi ser êşa canê xwe de tewiyan û qêriyan. Lê piştî ku bi nexweşiyê du zarok mirin, xwediyê xênî, xanî ji textikan kir û bizûz ne man û hin kurdan jî alîkarî dan wan, bayê nexweşiyê piçekî şikest.
Her tişt mîna berê xerab geriya û xerab çû. Her tiştî di demeke kurt de li wan da der. Bi barkirina bajêr re heqîqetê rê li ber xewn û xeyalan girt û ew di kuç û kolanên xerîbistanê de, bi çengelên zemên ve daliqandin. Bi camêrî tevgeriyan û rêyek nema ku ne dan ser, lê temamê rêyan li ber wan hatin girtin. Her ê ku bi tiştekî rabû û destê xwe avêtê, tişt li ber winda bûn û destvala vegeriya. Bi vir de çûn li koncalan terpilîn, bi wir de reviyan li dîwaran qelibîn. Şev li rojê, roj li şevê siwar hat û geriya û temamê wextê wan bi ax û keseran bihurî. Li gora terbiya wan, di warê camêriyê de çi tiştê ku divabû bihata kirin, hemû kirin û tiştek jî bi dest ne xistin. Çiqasî bi wir de çû, jiyan bû gilokeke rês, di hinavên wan de geriya û tesîra

xwe li her tiştê wan kir. Di dawiyê de wan jî pê li exlaqê civaka xwe kir û di hindurê hûrê xwe de, kultura xwe hêrand.
Faro berî her kesî dev ji malbatê qeriya û bi dû qehbikên bajêr ket. Salih piştî ku bû «dombalacî» û di dombelayê de tiştek bi ser ne xist, bû araqvexwir û herwiha şev-
275
der ma. Lê ew jiyana wî a bi wî rengî mehekê jî dom ne kir. Li kolanên «Turkeşçiyan» bi kurdî qêriyabû û turkeşçî jî lê der bûbûn. Ew dabûn ber kêran û laşê wî bi carekê ve herifandibûn.
Serhên jî mîna Cidhên xwe li girtina masiyan şidand û her roj du-sê kîlo masî anîn malê. Zarokan li nav sûkê û di kolanên bajêr de simît firotin. Lê simîtfiroş ewqas pir bûn ku, zarokan bi zor û heft beleyan bihayê taştê bi dest dixistin. Rewşa zarokên ku qundere boyax dikirin jî xerab bû.
Wan jî ji destê piraniya 'boyaxçiyan' di karê xwe de xêr ne didîtin. Carina destvala û carina jî bi heqê çend qalib sabûn vedigeriyan malê.
Hesûkê ku mal li hev radigirt û ling ne dixistin bin xwe, piştî ku bi vir de û wir de çû û hat û tu kar bi dest ne xist, çend rojekî li malê rûnişt û li tiştên xerab fikirî.
Xwest ku bibe qatil û bi peran mirovan bikuje. Lê di têkildanînê de heyirî ma. Dev ji wê berda û vê carê jî serê xwe bi firotina eroînê re êşand. Di wî karî de jî têkilî pêwîst bû û bi ser de jî bi tirkî xweşik nizanîbû. Li qewadiyê fikirî.
«Aha ev dibe!» got û da aqilê xwe. Di dawiyê de destên xwe di ber xwe re berdan û wî jî mîna gelek derketiyan

qîma xwe bi xêr û bereketa çopa bajêr anî. «Hoooweh kuro, bê vê Kurdistanê çi kir ji serê me! Di taliya emrê me de em li çopê hesilandin», digot û dibiland. Her roj bi sariya sibehê re wê xwe berda nav lodên çopê, kaxet û şûşe mûşe bidana hev û bi pereyekî avêtî bifirotana. Hesûk bûbû hestiyê pişta malê.

Dura jêhatî karê xwe bi dest kesî ve berneda. Piştî ku keleh keşif kir, tifik di qorziya xirbeyekî wê de danî. Zarokan ji vir û wir dar û textik jê re anîn û wê jî zorî da nanê

276

sêlê. Ji bilî keçan hema hema her kesî tiştek da ber xwe û mîna gêrikê tevgeriyan. Pir bazdan, pir westiyan, pir peyivîn û pir hindik xwarin. Xwarin jî çawa xwarin bû!...

Di vê navê re Circîs jî bi karê xwe ê herî girîng daket û li ser gotina Fermên keçik serbest berdan. Keçan jî xwe şahîk û mahîk kirin; li kolanên kurdan geriyan û di ber qehweya di serê kelehê de çûn û hatin. Di wextekî kurt de ji vê qehweyê qismet hat ser çar keçan. Çar zilamên kurd û lihevhatî bi «Qewlê Xwedê û Resûlê Ekrem» keç xwestin. Circîs bi wê yeka han xwe bextewar dît. Wek mirovê ku ji otobusa nav bajêr mabû û otobus jî li bendî sekinîbû, lê hatibû. Tiştekî zêde kêfa xwe dianî! Bêyî ku wan ji nêzîk ve nas bike, li gora zarxweşiya wan kir; miftîbelaş mehra wan birî û wek heywanan ew xistin ber wan. Lê xebera ne xêrê zû pê ve giha. Lê ma ji nû de dikarîbû çi bikira? Heger ecele li keçan ne kiriba û ew di hindurê hefteyekê de ne dabana mêran, wê bi meseleyê hisiyaba. Him Fermên bi xwe gelek caran jê re gotibû ku mezinên qewadên

bajêr kurd in. Kurd li vî bajarî serkêşiya temamê fihl
û finasan dikin. Kerxaneyên seyar, qumarxane, bar û
pavyon di destên wan de ne. Dombalacî ne. Keleşiyê
dikin. Heşaşê difroşin. Ji vir û wir xeracê distînin...
Herçar xwazgêniyên neviyên Circîs endamê rêxistina
qewadan bûn û keçik xistibûn rêya xerab. Karê wan ev bû.
Ew yeka han di serê gelek malbatên koçber de kiribûn.
Qewadan piştî ku qeflek mêr berdabûn ser wan, ew firotibûn
petronên kerxaneya Stenbolê û dinyayek pere ji xwe
re stendibûn. Circîs li xwe dixist, digot û dibiland:
«Hoooweh li vê ecêbê! Min bi destên xwe mala xwe
xerab kir! Kerxane, kuro! Em û kerxane! Aha ev bû dawi-
277
ya Kurdistana me! De îcar safî bikin! Wek ê ku çûbû heyfa
bavê û qûna dê li ser kiribû, li me hat. Kuro Circîsko, ma
qûn bi tenê? Erê, me nav şeqkên xwe kir piştî û bar, li ser
kolînka xwe kir û em ji ber xezeba eskerên tirko reviyan û
van qewadên me ên serê kelehê jî, ew bar û piştî ji tirko re
talan kirin. Îcar niha wê zarokan jî ji tirkan re bînin. Û ew
zarok jî wê mîna eskeran bi me re bipeyivin û di dêya me
...in! Hahooo! Keçê Durê şîretekê li min bike, min aqilê
xwe berdaye!...»
«Oftaaan tu bila wilo li te hatibe! Te bi a min ne kir û
te keç serberdayî berdan. Ji keçên serberdayî aha ev derdikeve,
ha!»
Circîs piştî vê qebheta ku bi serê xwe de anî, çûna sûkê
li keçan qedexe kir û ew di malê de hîsîbîsî kirin. Lê bi vê
jî tenê nema. Keçên wî sipehî bûn. Tedbîra wî a herî mezin

ew bû ku ruyê wan tenî bikira. Wilo kir. Lê piştî ku Durê û Cidhan pê de xeyidîn, bi şîretên pêxemberî li keçan şidand û bi metodên xwe ên eskerî vê carê jî berê xwe da zarokan. Zarok di demeke kurt de hînî tirkî bûbûn û di nav kurmanciya xwe de yekliban gotinên tirkî bi kar dianîn. Kirasê xwe diçirand! Diniquçand vî, şiqam diavêt wî û bi xeberan raserî wan dihat. Lê fêde ne dikir. Wî çiqasî da ser wan, wan jî ewqasî henekên xwe pê kirin û bi aqilê wî keniyan.

Her ku bi wir de çû rewş hîn xerabtir bû û dil û canê Circîs ariya. Heyfa Perîxanê ji bîra kir û Nesîmaya ku wê di pevçûna xwe de bi kar bianiya, ji serê xwe avêt. Li Zorava xwe jî êdî nema ewqasî fikirî. Dev ji stranên xwe ên kurdî berda. Car carê ji xwe re ditewirand ewqas. Wekî din jî, li dijî partiyê êdî mîna berê gotin bi vir de û wir de

278

nema teriqandin û li dostaya xwe û endamên wê geriya. Li gora xwe wî jî siyaset dimeşand. Di stuyê wî de hîn gelek keçên zewacê mabûn. Û qepraxên bajêr ev keç her tim dikarîbûn birevandana. Lê gava ku keç bûbana ên partiyê, ya wê bihatana kuştin û yan jî wê bûbana jinên kurdan. Wilo difikirî.

Piştî bi derberdana keçan û guhertina di Circîs de, partî jî rehet ne sekinî; zend û bendên xwe vemaltin û bi hêl û mêl tevgeriya. Bi qirûqehfikên malê, xwarin û mesrefa rojane, giraniya xwe danî ser malbatê û ha ha endamên xwe ên zarxweş û beşerxweş bi ser wan de şand. Piraniya endaman ji pîrek û zilamên navser pêk dihatin. Wan û Circîs

bi fen rahiştin hev û mîna kose û berkoseyan bi hev re
meşiyan. Circîs law bi xwe hiştin û keç ji wan re berdan.
Heta ku jê hat law dûrî wan girtin û xwe li lawan rapêça.
Endamên ku bi cilên kurdî û bi hirmet rûdiniştin, xweş
kirin û Circîs jî di bin simbêlan re beşişî û geft li wan
xwar. Ew keniyan û ew jî di nava xwe de keliya û giriya.
Wan, keç li dora xwe civandin û wî jî çavên xwe ji wan re
girt. Keçan jî li herdu hêlan nerîn û guhdarî kirin; roj bi roj
di hizûra bapîrê xwe de peyivîn û gundorên siyasetê niqirandin.
Bapîr xwe kerr kir. Yeko yeko bi endaman re servekirî,
bi pantor û qundereyên kabikî xwe berdan nav
bajêr. Bapîr xwe li kwîrayê danî. Hin ji wan şevder man.
Bapîr dengê xwe ne kir. Bi pere hetin malê û bê pere ji
malê derketin. Bapîr kêfa xwe anî. Selikên fêkî, tenekeyên
rûn, çewalên birincê, kîsên meqerna, laşên berxan kirîn
û ji bapîr re gotin:
«Kalo, ev ew partiya ku te bi salan pê re dijminahî kiribû
vê insanetiyê bi we re dike. Partî dostê temamê jar û
279
hejara ye. Partî gelê kurd di ser hemû tiştî re digire. Lê
mixabin Kalo tu carî di mezinahiya partiyê de negiha. Û
bi ser de jî em jê dûr kirin...»
Car carê bi kebabên Kemeraltiyê, lehmacûnên Basmahanê
û bi peqlaweya Karşiyakayê jî xwe dadan hindur. Ser
Durê tije ardê xas kirin û dengê xwe hildan:
«Pîrê, ka qaşo law ji keçan çêtir, xurttir û jêhatîtir bûn!
Ji vê malê qismê nêr, hemû bûn parsek. Lê tu dibînî bê em
jî çawa ne. Em ji wan jinên ku Kalo pê li wan dikir û ew

ne tiştek didîtin. Jin bi her haweyê xwe ji mêran çêtir in.
Û heta mêrxastir in jî...»
2
Gelek ne ket wê navê, pênc keç ji nişkê ve nebedî bûn
û di malê de birçîbûna berê dîsa serî hilda. Ne Circîs li
keçan pirsî û ne jî di vî warî de partiyê tu agahdarî da Circîs.
Bi ser de jî endaman rêya xwe ji ser mala wî birîn. Ji
bilî ku her ji çend rojan keç û xortekî endam, bi zimanekî
çort pirsa herdu keçên revyayî ji maliyên wî dikirin, tu kes
bi ser ne diket. Lê piştî ku sûretê neviyeke xwe di rojnameya
partiyê de dît, dîsa bû ê berê. Çi tiştê ku hat ber devê
wî got û serê şûrê xwe sût:
«De ji xwe re li vê ecêbê binerin! Him canê keçikê bi
kêran diterişînin, him dişewitînin û him jî wê wek taca
serê kurmancan ilan dikin! Ev çi celeb in, hahooo! Minafiq
jî ne wek van in! 'Bi gur re dikujin û bi xwedî re jî şînê
dikişînin.' Ê ne ez ê dev ji wan bernedim. Xwedê ez ji bo
şer û pevçûnê xuliqandime...»
Durê:
280
«Kalo bes bike bire bir, dengê te li gasînê vedide. Dev
ji ên çûyî berde û bi ên mayî dakeve. Ji bo stara keçikan jî
mabe, divê tu bela xwe ji partiyê vekî. Hinekî bêdeng
bisekine da av ji ser van herdu nestiryan bizelile»
«Keçê heger ku ez bi vî haweyî nezirim, ma wê çawa
bêhna min derkeve, lêêê!»
«Bavo belkî jî ne wan keçik kuştibe. Polîs ji wan
xerabtir jî dikin. Ma polîsan hindik kuştin!»

«Ras e rast, lê ez wek dînê xwe dizanim ku wan kiriye.
Na na. Ev karê wan e. Keçê ma ne lê xwedî derdikevin.
Ma çi elaqa derbên kêran û şewatê pev re heye, hi? Mesele
li ku qewimiye û ew meselê li ku diqelibînin.»
«Ji ehmeqiya xwe dikin...»
Rojnameyê termê keça ku polîsan di bîst û yekê adarê
de, li nav daristana hêla Bornovayê dîtibûn û teslîmî wî
kiribûn, bûyer li ser girê Goztepe edilandibû. Şewta wê bi
pîrozkirina Newrozê ve girêdabû û ew wek qehremanekê
dabû naskirin. Di eslê xwe de heger ne ji bûyera Newroza
berî vê ba, dibû ku bi vî haweyê piştras, şika Circîs ne
çûba ser partiyê. Gava ku çend endaman di nav xiramên
daristana Balçovayê de, keçeke ciwan bi lêdanê girêdabûn
û keçikê jî dikir hewar hewar, gelek kesan ew dîtibûn û
endam nas kiribûn. Di dawiyê de keçik hatibû şewitandin
û ew jî mîna a Circîs di rojnameya partiyê de qehreman
ilan bûbû. Lê xelkê bi wî haweyî qebûl ne kiribû; dilê xwe
bi zilma ku lê hatibû şewitandibû û bi dizî li ser giryabû.
Şewata wê bûbû sebebê ku gelek kes ji partiyê veqetin.
«Ji ehmeqiya xwe çawa, dijmin in û dijminahiyeke bi
henekpêkirin bi me kurmancan re dikin», Cidhên got û
dewam kir:
281
«Li aliyekî mamosteyên tirkan dikuştin û li aliyekî jî
wan bi xwe di qul û qulêr û di şikeftan de kurd hînî tirkî
dikirin. Ma ev ne henekpêkirin be naxwe çî ye? Her derê
welêt tije qereqol bûn û wan mektebe dişewitandin. Ji me
re digotin bi kurdî bixwînin û kitêbên tirkî didan me. Li

ser bergên kitêbên xwe bi kurdî dinivîsandin û hindurên wan jî hemû bi tirkî bû. Bi me re bi tirkî dipeyivîn û ji me re jî digotin li kurdayetiya xwe xwedî derkevin. Qaşo bi kurmancî distiran û nizanîbûn bi kurmancî, yaho! Dev ji tabûran berdabûn û digirtin ser gundên pîberan. Tengî melayên bi dîplome ne dibûn û bi melayên bê dîplome dadiketin...»

Hesûk xwe jê xerabtir kir:

«Erê kuro, ji wê rebenka dêya min re bi tirkî belavok dixwendin.»

Cidhan bi hêrs got:

«Zarok kiribûn mezinê me, yaho! Ma ne henekpêkirin e ku mirov zarokekî bike mezinê rîhsipiyekî wek bavê min!...»

Hesûk beşişî û ji bavê xwe re got:

«Yabo, te ev zilam jî xurifand. Wî werin sêra berê. Bila ew nekeve nav vî karê me ê xerab. Li wê dinyayê ji me re lazim e...»

Circîs piştî ku Cidhên di kerxaneya Tepecîkê de alîgirekî partiyê ceze kiribû, hilfa xwe tam dabû ser Cidhên û qîmetekî bihabilind didayê. Cidhanê ku zewqeke mezin ji kerxaneyê distend, piştî karê xwe, hema hema her şev wê biçûya kerxaneyê û qederê du-sê seetan ji xwe re li çîmrûtan bineriya. Îcar şevekê çima ew û alîgirekî partiyê li hev rast nayên. Herdu hevdu nas dikin û hatine himberî

282

hev:

«Tu li vir li çî xwe digerî, heval?» Cidhan bi zirt

dibêje.
«Ma tu li vir li çî xwe digerî?»
«Waaa, tew hîn dikare zimanê xwe dirêj bike û hesab jî ji min bixwaze, hi! Hevalan ez li vir kirime berpirsyarê bê ka kî diçe û tê, zû cezê xwe bide!»
Dest û lingên mêrik li hev digerin; xwe diavêje bextê wî, du sed û sîh dolar û şêst markên li ser xwe, dixe destê wî û dibêje:
«Ez xulamê te me, min bisitîrîne!...»
Piştî vê bûyerê Cidhan tahmişkî bûbû û seetên nobeta xwe dirêj kiribûn. Mîna vî sê kesên din jî qefandibûn. Lêbelê tu perekî wilo mezin bi dest ne xistibû.
Circîs piştî ku ji Hesûk re got, «Cidhanê min zilamekî mezin e», Cidhên xwe mezin dît û wek avê pê de çû:
«Xerabiya insên çi dibe bila bibe, mirov insanan di hoperloran de nazirîne û nahorî ne. Li mala xelkê nan naxwe û xelkê nakuje. Erê ma dibe ku hema mirov bikuje û bikuje. Ma ji kuştinê pê ve tiştekî ku bikin tuneye, weh!»
Circîs berê xwe dayê:
«Baş e, ev çima min nakujin? Gelekên fena min kuştin.»
Hesûk bersiva wî da:
«Xwedê jê raziyo, tu bi xwe dibêjî ku mezinên partiyê tirk in. Û tirk jî dibêjin ku 'Çektirmekten oldirmekten îyîdir.'Yabo, te ji bo çektirmekê hiştine. Ji bo ku tu ecêban bibînî, ecêb!...»
Bi hatina polîsan re, ji bilî Circîs, gur li hemiyan ket û ji tirsan kesî rêya ber sola xwe ne dît. Polîs jî mîna ku teba

têkevin hindur, bi serpozkan alav bi vir de û wir de avêtin û Hesûk û Cidhan dan ber kulmisk, pehîn û sîleyan:
«Hûn, wan herdu gewendeyan ji ku derê tînin bînin, yana em ê we hemiyan bigrin; li we xînin û pişt re jî we hemiyan bikujin. Kuştin karê me û nebedîkirin jî sinhetê me ye...»
Van jî mîna polîs û endamên partiyê bi cihê herdu keçan nizanîbûn. Keçikan piştî ku li ser gotina Circîs, bê emrê berpirsyarê xwe polîsek kuştibûn, berpirsyêr jî ew wek du provakatoran dîtibûn û li wan dabû demaçeyê. Lê keçik jêhatî derketibûn, ew berî wî bi xwe ve gihabûn û serê mêrik ji hev belav kiribûn. Pişt re jî bêhnçikyayî xwe avêtibûn mala Fermên. Ferman jî li ber barê wan rabûbû. Di eynî şevê de xwe gihandibû Circîs û keçik li Izmîrê li çend malên dostên xwe bi cih kiribûn. Kêfa dostan pir hatibû ku du keçên mêrkuj beşdarî nav wan bûbûn û wê bi qeweta van keçan hîn gelek berpirsyarên partiyê kuştibana. Çar kes bi wan dabûn kuştin.
Polîsan piştî ku çend pehîn di Durê û Circîs de jî werkirin û çewalek xeber bi hemiyan re kirin, di hindur de çend fişek berdan û destvala çûn. Circîs jî hema bi dû wan de xwe şidand û bi kêf got:
«Hesûk xwe zû pevxe û bi min re were.»
«Xwedê xêr neke yabo, dîsa çî ye?»
«Vê carê xêr tê de heye; ez ê bi Seydo re bipeyivim. Ew lawik hîn ji hêka xwe de baş bû. Tiştê ku ji dest bê wê bi me re bike.»

«Çi ji dest tê heta ku bike?»
«Ma çi qewimî gidî! Qet nebe hema ew û Sînano, di nav xwe re wê karibin çend qurûşekî ji me re bişînin. De
284
bide dû min.»
«Tu xweş dibêjî, lê de ka ku mêrik bihata zeftê. Her tim ne li mal e. Ev belkî pêncî car e ku ez jê re telefonê dikim û ez wî zeft nakim. Dev jê berde çûna me vala ye. Û a din jî niha ez nizanim bê em doza çi li vî lawikî dikin. Derdê wî jî bi qasî ê me pir e.»
«Derdê wî jin in, ew bi jinan daketiye. Lê ê me her tişt e, lawê min. Were bide dû min û dirêj neke.»
Herduyan dan dû hev û ber bi qulûbeya telefonê de kişiyan. Qulûbê ji mala wan tibabê çarîkekê dûr dihat, lê ew di neh-deh deqîqeyan de gihanê. Bêhna Circîs çikiyabû; xwe da ber deriyê qulûbeyê û mîna dizan li lawê xwe nerî. Lawê wî jî qerta xwe a ku hîn ji du meh berê de kirîbû li dengderka telefonê rast kir û bi lez tiliya xwe li ser pişkokan gerand. Bi cara pêşî re ne bû. Bêhêvî bû. Xwe aciz kir, çend xeberên genî dan û bêdilî xwe pê li pişkokan kir. Lê vê carê şensê wî pê re giha. Çawa ku zengil lêxist, wilo jî çeng bû wê navê û gazî bavê xwe kir:
«Werêyê, li mal e!»
Circîs bi kêf xwe dada telefonê û heta ku jê hat dengê xwe rakir:
«Lolo Seydooo, berxê minooo, qiyamet bi serê me de hatiye, looo! Ew kalikê te Circîs, li welatê romê bûye parsek. Lawo rêyekê bibînin û me ji vê hêsîriyê xelas bikin,

kuro» got û dest bi girî kir.
Seydoyê ku ji serî heta binî bi rewşa wan dizanîbû,
xwe li ber giriyê wî ne girt û bi kel û girî peyivî:
«Min ji bo we serî li gelek meqaman da û min tiştek bi
ser ne xist. Min devê xwe li ber her kesî xwar kir da ez bi
rêya qaçaxçiyan we bînim vir, lê kesî qurûşek neda min...»
285
«Lawo ma tu û Sîno û ên din qey hema hûn nikarin
çend qurûşekî jî ji me re bişînin? Çi qewimî gidî!»
«Ma qey hûn bi Sîno ne hisiyane?»
Circîs veciniqî û bi tirs got:
«Çi çi! Çi bi Sîno hatiye?»
«Sîno bûye fêrisê zindana Diyarbekirê. Ji ber jina xwe
reviya Tirkiyê û hat girtin. Niha li Diyarbekirê di girtîgehê
de ye. Restem çû başûrê Kurdistanê. Li wir bi cih bûye
û sê jin ji xwe re anîne. Silêman jî bûye bênamûs, rêya
xwe ji ser kurdan biriye û qurûşekî xwe nade tu kesî. Lê
edreseyeke saxlem bidin min ku ez ji we re çend hezarekî...
» got û qerta telefona Circîs qediya.
286
BEŞÊ SÊZEDEHAN
1
Sînanê ku bi keça Mela Salar re zewicîbû, ev belkî cara
pêncî bû ku ji ber jina xwe reviyabû û li nav bajarê Stockholmê
şevder mabû. Di dawiyê de wî jî bi a Seydo kir û di
demeke ku birek jin li mala wî diwenisîn û bi hev re dixwar
û vedixwarin, li himberî jinikê serî hilda. Di eslê xwe
de sebeba serhildana wî jî nexweşiya wî bû. Dîsa qolincê

avêtibû gurçikên wî.
«Kuro zû wan firaxan bişo û dû re jî zarokan derxîne parkê!»
«Li ser herdu çavên min, ez ê bişom, lê ez niha naşom. Piştî ku min zarok anîn...»
Jinikê xwe ji mahdê wî ê tirş û zarê gotina wî aciz kir. Heger devlikenî û bi hêdî gotiba, ji ber rewşa hindur, dibû ku dengê xwe nekira.
«Ez ji te re dibêjim bişo! Û dirêj neke, temam!»
«Ez naşom û dirêj jî dikim!»
«Baş e, ma ne em ê niha li hev vala bibin!»
«Keçê ez naşom û hew!»
Jinikê xwe ne girt, dirêjî şimika li wê navê bû û têwerkir. Şimik di ser bêvila wî re xijiqî û li sûretê bavê wê ket. Sûret ji dîwêr hate xwar, pengizî ser maseyê û li binguhê qedehên şarabê ket. Şerab bi derûdorê de rijiya û li cibe û şaşika Mela Salar veda. Bi vê yeka han jinik tam ji ser xwe çû û xwe dadayê. Sîno jî hema yekser bazda û rêya mala Seydo girt. Rev ew rev bû û tu carî nema hate malê. Lê bi vê jî bi tenê nema. Him telefon di ruyê jinikê de girt û him
287
jî dîlekçeya ku xwe û wê ji hev xelas bike rêyî mehkemeyê kir. Jinikê jî xwîn bi xwe ve dît û bi alîkariya hevalbendên xwe ên swêdî, li mêrik tam şidand. Sînan li xaniyan geriya. Lêbelê digel ku bi mehaş bû jî, şirketên xaniyan xanî ne danê. Piştî çendeyekî jî, vê carê problem di nav wî û petrona wî de derket û petronê jî ew ji kar avêt. Sînan li wê navê ma û ji bêgavî li komeleyeke kurdî xwar û vexwar

û raza. Lê li vir jî nestirî. Seet li derdora duduyê şevê diz ketin hindurê komeleyê û ew jî di xew de bû. Dizên ku jê bê hayî bûn, bêyî ku elektrîkê pêxin, xwe gihandin ber kompîterê û li kaployên wê xebitîn. Çawa ku Sînan bi xire cirê şiyar bû, wilo jî qêriya, «haho, zilamên Reyis!» got û xwe li pencereyê qerase kir. Van ên din jî xwe li derî. Heta ku dizan di hikmê deqîqeyekê de xwe gihandin sikakê, Sînan bi lingê xwe ê aryayî giha serê sikakê jî. Îcar piştî ku li vir li hev rast hatin, herdu hêl jî ji hev tirsiyan û her yekî bi derekê de bazda.

Piştî vê bûyerê Sînan bi reva ku ji ber dizan kiribû li ber xwe ket; ji dil ji jina xwe hêrs bû û li ser çûna xwe a welêt ponijî. Li dora du hefteyekî bi xwe re da û stend û got:

«Ez di qada şêx û melayên kurdên gelparêz de gunehkar û di a mîr û beg û axayên welatperwer de jî sûcdar im. Gunehkar û sûcdarekî wilo ku li ser doza kurdan, bi sedan xortên miletê wan daye dû xwe, reviyaye û ew xort jî di ruyê wî de hatine girtin û kuştin. Ez gunehkera im, ji ber ku li vî welatî şexsiyeteke min e kurdî ne maye. Ez sûcdar im, ji ber ku ez dikarim mezinahiyê li beşekî welêt bikim, min welat ji zilmê re berdaye û li vir ez bi zikê xwe daketime. Îcar ez xwe bikujim baş e, yan ez herim welêt û bêm

288

girtin baş e?»

«Girtin ji kuştinê çêtir e», got û li ser vê gotinê ma. Kompîtera ku bi duwazdeh hezar kronî kirîbû, bi hezar kronî û televizyona ku bi heft hezar kronî kirîbû jî, bi pênc

sed kronî firot hevalên xwe. Û wekî din jî, dîsa ji sîh û du hevalên xwe hezar û sed kronek da ser hev, xist ser çar hezar kronê bi xwe re, bilêt birî û berê xwe da Tirkiyê. Sînan li balefirgeha Stenbolê dadikeve û di kontrola polîs de asê dibe. Polîs kitêbka Astrîd Lîndgren ku ji bo zarokan wergerî kurdî bûbû, didin dest hev; rûpelên wê bi vir de wir de diqulipînin û dibêjin:
«Ev kitêb bi kurdî hatiye nivîsandin. Û nivîskarê wê jî kurd e. Navê xwe qulipandiye swêdî.»
Sînan piştî ku belkî bîst carî Astrîd wek nivîskareke swêdî û navdar bi wan dide nas kirin, radihije kitêbê û li dor du rûpelên wê bi swêdî dixwîne. Polîs bawer nakin. «Nivîs bi kurdî ye, tu kê dixapînî», dibêjin û wî rast dibin êşkencexaneyê. Li wir piştî ku wî nas dikin, bi lêdanê wî dinermijînin û vê carê jî berê wî didin êşkencexaneyên Diyarbekirê. Mafir di dawiyê de sawcî ji benda 125an dozê lê vedike û ji wê bendê mehkeme dibe. Di nameya ku bi rêya gardiyanekî kurd, ji Seydo re şandibû wilo nivîsîbû. Vê nameyê pir tesîr li Seydo kiribû:
«Wey sed xwezî bi birçîbûn û lêdana gardiyanan û ne bi zilma jinên kurdên li Swêdê. Li vir hema çawa be heqekî mirov î liberxwedanê heye. Lê li Swêdê ew jî tune bû. Li vir manewiyet heye. Lê li wir heta bi navê wê jî tuneye! Ez ji insanetiya xwe derketibûm. Li himberî jinikê ez ji hin soriyan jî xerabtir bûbûm! Ew çi bû, min çi bi xwe de anîbû? Lê ez li vir zilam mim, zilam. Her roj dev û ruyê
289
min di xwînê de dihêlin. Min dadiliqînin. Mîna dozerê di

ser kelaxê min re diçin û tên. Seydo bawer bike, ji ber ku ez li ber xwe didim, ez naêşim jî... Kuro were û van hinerên min ên ku swêdiyan û wê jina min a xerab e fetisandibûn, ji xwe re bibîne. Di hicreyan de qebqeba min e. Ez bûme Circîs û Reşoyê Sarê!... Mêrikan, min fîlozof û qehremanekî kurdistanî dibînin. Û ez jî bi wî çavî li xwe dinerim. Lawo were, tu ê li hatina xwe poşman nebî...»

Wî wilo li ber Seydo dida û Seydo jî li ser berdana wî, meqam bi meqamê swêdiyan digeriya. Di vê dema ku Seydo hinekî Circîs ji bîra kiribû û ji bo Sînên ling ne dixistin bin xwe de, Circîs dîsa telefon kir:

«Lawo Seydooo! Kuro tu dizanî bê ez kî me, looo! Ez ew Circîsê ku bûye bavê keçên di kerxaneyan de me, hahooo! Lawo ez dest û lingên te maçî dikim, hema çend qurûşekî bişîne, kurooo!...»

Seydo xwe li ber ne girt; qêriya û bi kel û girî xwe avêt derve. Bi tenê bû û bi ser de jî bê pere bû. Pêşî bazda postexaneyê. Seet nehê şevê bû û postexane jî girtîbû. Vekirîba jî ne dibû tiştek. Li sed kronê li ser bîst kron heqê şandinê diçû. Mîna dînan bi nav bajarê Stockholmê ket û ji vê malê çû mala din. Qederê hefteyekê ne tebitî, bi vir de û wir de çû û hat û stuyê xwe li ber nas û nenasan xwar kir. Nas û nenasan pere ne danê. Bi deynê xwe xwest, dîsa ne danê. Doza ku bi keç û jinebiyên Circîs re bizewicin, li wan kir. Nasên wî xwe ne dan ber. Îcar piştî ku pere wek parseke insanî ji wan xwest û hin ji wan him pê keniyan û him jî ew ji mala xwe qewirandin, xwe avêt hin mêrên swêdiyan. Çend mêran zewac qebûl kirin, lê hema pê re jî

lê qulipîn.
290
Seydo xwe tam di halekî heyirî de dît. Malbata wî ro bi ro dihiliya û tiştek ji dest ne dihat. Di dawiyê de wî jî qezda kuştina xwe kir û bi xwe re kete devjengê:
«Mirov kengî xwe dikuje?»
«Mirov xwe nakuje, ji ber ku hey wê mirov bimre.»
«Ev jî gotineke dînî ye. Mirov kengî xwe dikuje?»
«Gava kuştin fêdeyê bide ên mayî...»
«Ev jî ne bû. Ji bo çi, çima wê fêdeya hinekan di kuştina min de bicive? Ez qebûl nakim. Ev ajîtasyone. Ez divê xwe bikujim. Lê mirov kengî xwe dikuje?»
«Gava ku tunebûna mirov ji hebûna mirov çêtir be.»
«Ev hinekî wek ku rast e xuya dike, lê tiştekî wê û rastiyê bi hev re tune. Tunebûn ji hebûnê tu carî ne çêtir e. Gotineke îdeolojîk e û her tim bi kêrî siyasetgeran hatiye. Min kuştin heq kiriye. Lê ez ê kengî xwe bikujim? Niha, sibe, dusibe, kengî? Ez pir diêşim, diêşim!»
«Mezinahiya mirovê ronakbîr jî yek jê ew e ku xwe li ber êşê bigire û li rêya xelasiyê bigere. Û tu jî ronakbîrekî temam î. Dev ji vî aqilî berde.»
«Malbata min telef bû! Xelkê min hat girtin û kuştin û bi dinyayê de terqiya! Kurdên bakurê welêt ji qada tarîxê dikevin. Û heger ew ketin, tirk, faris û ereb wê ên din jî di wextekî kurt de biqedînin. Bibin dewlet jî wê qîmet neke. Hebûn û nebûna kurd û Kurdistanê bi bakurê welêt e. Û ew bakur jî mîna pîşotê dişewite. Ez gunehkar im. Ez jî yek ji wan kesên ku min xelk rakir ser tapanan û dû re jî

ez reviyam.»
«Lê li gelek welatên dinyayê jî wilo bûye. Li birêvebiran teng bûye û reviyane.»
«Lê piştî demekê, ji bilî çend kesên xerabe, hemû jî ya
291
vegeriyane û yan jî bi haweyekî doza xwe meşandine. Ez divê xwe idam bikim. Min gelek xort kirin hevalê Reyis. Û gelek ji wan li çiyê hatin kuştin; gelek ketin girtîgehan û di bin darê zilmê de can dan. Mirovê ku xwedî ûjdan û şexsiyeteke tebût be, divê hesabekî wilo bi xwe re bibîne. Zarokên xelkê têxe nav rêxistinê, bide girtin û kuştin û piştre jî bireve Ewrupayê û li mala xwe rûne, ha! Ew mirovên ku wek kadro û sereke dihatin nas kirin, divê yek bi yek mehkeme bibin û cezeyê xwe bibînin. Min zarokên xelkê xapandin. Min ew li wir hiştin û ez li wan venegeriyam. Ma derew e, hi? Ûjdanê Serdêr qebûl ne kir û çû. Yan ji çûna min û yan jî ji idama min!»
«Tu gunehkar î, rast e. Lê heger tu jî wek Sînên here û doza xwe bimeşînî, wî çaxî jî tu dibî şirîkê êş û mereza Circîs û temamê xelkê xwe. Tu ji gunehên xwe pak dibî.»
«Min li xwe pir kir dereng, ez pir diêşim, ez pir li ber xwe dikevim!...»
Seydo xwe li ser rayên trêna nav sûka bajêr veziland. Trên hat û fîkand. Wî ne guh lê kir û ne jî çavên xwe kutkutandin. Kelaxê xwe bi erdê re kire yek û diranên xwe bi hesinê wê ve seqandin. Trên sekinî. Digel ku bêhna mirinê bi hatina trênê re di bêvila xwe de hîs kir, dîsa jî dev ji xwe berneda. Piştî vê bûyerê bi du-sê rojan, vê carê jî bi

jehra kêzikan rabû ser xwe û berê xwe da nav daristanên Stockholmê.
Termê Seydo, di bin berf û barana ezmanê Swêdê de, tibabê du mehan li erdê ma. Piştî ku termê wî hate dîtin, kurdan jî merasimeke delal jê re çêkirin; bi sedan nas û dostên wî li ser gorê civiyan û gor di gul û beybûnan de xemilandin.
292
BEŞÊ ÇARDEHAN
1
Piştî ku çend gavekî ber pê de meşiya, di ser serê wî re mîna stûneke reş sekinî û bi haweyê ku tiştekî jê re bibêje bêhnekê lê nerî. Ne got û xwe avêt himbêza wî. Herduyan jî xwe li hev pêçan. Wê ew maçî kir û ew bi sênga xwe ve şidand. Ruyê wî zer veda, ricifî û devê xwe bi çarîka wê ve dewisand. Vê kire îske îsk û wî jî bi dizî hêsir barandin. Kuflet jî behetî li wan temaşe dikir. Piştî tibabekî wilo bi vî rengî, herdu jî hêdî bi hêdî sist bûn û ji hev vekişiyan. Wê devê xwe dagirt ku a di dilê xwe de bibêje, lê dîsa cesaret ne kir. Bi çavan ceriband. Li himberî wî çong berdan erdê; bi hinera awiran dilê xwe ê birîndar jê re vekir û dilê wî ê xerimî tev da. Eva niha di hesabê wî de tune bû. Ne li bendî tiştekî wilo bû û ne jî li tiştekî wilo fikirîbû.
Qêriya:
«Hahooo! Wax, wax wax!...»
Wê serê xwe berda ber xwe û di ber xwe de:
«Ya ez, yan tu», got û bi herdu destan dev û ruyê xwe heciqand.

Wî qîrên xwe dom kirin û mîna dîkekî serjêkirî li erdê perpitî:
«Wey liminê! Wey, wey wey!...»
Wê dîsa a berê got:
«Dawiya me ev bû! Ji min û te yek!»
Wî li sênga xwe xist:
«Ez ha, ez û ev tişt! Ez, ez ez!...»
«Erê tu.»
293
«Na, na, na, nabe!...»
«Dibe. Qey ew jî qedera me bû.»
«Ez keran berdim ser jina wilo qeder!»
«Tu çi berdî ser jî êdî nema fêde dike. Qebûl bike.»
«Ez nakim!»
«Tu nikarî nekî. Kuflet telifî.»
«Yek nemîne jî ez bi karekî wilo ranabim!»
«Hişê xwe bîne serê xwe, ji wê pê ve tu rê ji me re ne maye.»
«Ez tu carî nahêlim hişê min bê serê min!»
«Li tahtê neqelibîne, ez cêrî.»
«Ez li zinêr jî diqelibînim, xatûnêêê!» got û bi tepan bi nav serê xwe ket.
Destê xwe li ser keç û jinan gerand û got:
«Îcar ku hin ji van reviyan kerxaneyan tu ê çawa bikî?»
«Ger tu jî birevî kerxaneyan ez ê vê yekê nekim!»
«Baş e, madem wilo ye ez ê bikim.»
«Wilo ha!»
«Wilo. Ya ji min û yan ji te; ev e.»

Piştî ku polîsan bi qeweteke mezin girt ser mala hevalbendê Fermên û bi herdu keçan re hevalbend û du neviyên wî jî kuştin, vê carê jî bi reşaya êvarê re xwe dadan mala Circîs û ketûber her kes dan nav lingan. Hesûk, Cidhan û Serhan bi lêdaneke pîs rakirin qereqolê û ew li wir qederê du mehan hiştin. Nîvmirî derxistin mehkemeyê. Mehkemeyê jî hersê wek birêvebirên partiyê dîtin, ji benda 125an li wan şidand û ew rêyî girtîgeha Bûcayê kirin. Di vê navê re hin endamên partiyê jî vala ne sekinîn. Zirt li Miradê omerî kirin ku Circîs û kufletê wî ji xênî biavêje. Mirêd li ber xwe da. Lê piştî ku ji endaman lêxis-
294
tin xwar û di vê lêxistinê de diranekî xwe bi der da, ji Circîs kira xênî xwest û got:
«Apo, ez jî feqîr im. Ev sal û nîvek e ku hûn di xaniyê min de belaş rûdinin. Heger ji vir û pê ve hûn ê nikaribin kirya wî bidin, ji xwe re li cihekî din bisebibin...»
Circîs bi lêdana ku ji endaman xwaribû agahdar bû. Lê digel vî haweyî jî gotin bi endaman re kirin û li xênî bû zor. Ev serhildana wî him li hesabê Mirêd hat û him jî hişt ku Mirad ji endaman re bibêje «ez nikarim pê, hûn û wî li hev...»
Durê û Circîs mîna du kewan di hindurê xênî de çûn û hatin û li hev sincirandin.
«Em çima wek ê botî nakin û bi carekê ve xwe nakujin? Ma em kêmî wî ne!»
Kazoyê botî koça xwe rakiribû Stenbolê û di qorziyeke bajêr de konê xwe vegirtibû. Kufletê wî pir bû û bi ser

de jî lawê wî ê mezin yazdeh salî bû. Di hindurê du mehekî de hemû bi ser hev de nexweş ketibûn û li erdê veziliyabûn. Di dawiyê de dabû nava Kazo. Piştî ku temamê kufletê xwe bi jehrê kuştibû, kêrek li ser dilê xwe dabû û xwe jî kuştibû.

«Kalo, em ê ji xwe hey rojekê bimirin. Îcar çima em ê xwe bikujin û qetila xwe û van zarokan têxin stuyê xwe.»

«Xwekuştina li himberî pîsiyê rengekî şerefê ye. Bi tenê ev rê ji me re maye, em ê xwe bikujin û hew!»

«Kalo, Kalo, tu ji min çêtir dizanî ku şeref ji bo mezina ye. Em mezin belkî bikaribin bi a te bikin û bi haweyekî xwe bidin kuştin. Lê heqê me li zarokan tuneye; nabe ku em wan bi agirê şerefa xwe bişewitînin. Ew bê guneh in. Wê Xwedê vê yekê ji me qebûl neke.»

295

«Keçê behsa Xwedê ji min re neke, ez bûme kafir! Ma te dîtiye ku min rojekê berê xwe daye qublê û eşheda xwe aniye? Limêja mêrikê feqîr, zigurd, qewad, xwênî û hêsîran nabe! Em bûne ev hemû! Xwedê tiştekî me qebûl nake, nake!»

«Kalo bêhna xwe fireh bike. Bi bêhntengiyê em ê hîn bêhtir ber xwe xerab bikin. Erê, mîna Fermên, tu ê jî bikaribî du milyonekî bîne malê. Bike, ka binere bê Xwedê çawa dike. Helbet wê deriyekî xêrê li me vebe. Li gora hesabê min, gava te jî du milyonkek xist ser du-sê milyonkên zarokan, bi haweyê kûçikan ma be jî, em ê bikaribin xwe bidebirînin. Xem nake. Ecêbên wilo mezin hatine serê gelek lawên bavan.»

«Kurdistan û Kurdistan, aha dawiya wê ev bû ha!»
«Qey wê rojekê ew jî xelas bibe.»
«Weh çawa, tirrr!»
«Ez bi qurban, ji destê vê sefaletê em hemû bûne barûd
û dixwazin bi hev de biteqin. Bi te nakeve, tu nikarî xwe
bikî wek me, bi sebir be û xwe li ber bigire.»
Circîs ponijî û mîna ku şerbikê zêran bibîne, ji nişkê ve
xwe hilda û bi kêf got:
«Heh, temam, min dît! Pîrê ka em vegerin gund. Ma ne
wê doza pîberayetiyê li me bikin. Ma jê xweştir û çêtir!»
«Esker qebûl nakin û te nahewînin gund.»
«Belê wê qebûl bikin û min bihewînin gund. Ez ê ji
gotina wan dernekevim. Gava ku ez ji wan re mêran bikujim,
gundê xwe ji wan re bikim qerargeh û bibim xulamê
jinên wan, îcar çima wê min nehewînin gund. Hema ew çi
bibêjin ez ê wê bikim û hew.»
«Berê dibû, lê niha qet nabe. Te gund û filan û bêvan ji
296
dest xwe berda. Çû çû, ji serê xwe biavêje û li vir bisebibe.
»
«Ka em biceribînin, belkî bibe. Bi haweyekî ez dikarim
xwe bigihînim tûgaya Mêrdînê û ji generalan re
poşmaniya xwe bibêjim.»
Durê xwe zivêr kir:
«Kalo, tu carina tiştinan wilo dibêjî ku zarok jî nikarin
qebûl bikin. Mîna eva te gelek omerî û toriyan kirin; lê
tiştek jî bi dest ne xistin. Aha ji serê vê kelehê gelek kesan,
tew serî li generalên kolordiya Diyarbekirê dan û hemiyan

jî pişta stuyê xwe xurand. Bi ser de mêrên wan ên ku bikarîbûna bi eskeran re derketana çiyê jî hebûn. Lê dîsa jî eskeran rê neda wan. Dev jê berde û li vir tevbigere. Felekê xerîbî ji me re kire cih û war. Em man ên vî bajarî. Em êdî divê qebûl bikin...»

Piştî ku gotinên Pîrê di serê wî de rûniştin, bêdeng sekinî û tibabekî çavên xwe li ser kuflet gerandin. Kuflet jî mîna masîgirê ku ketibû ber pêlên behrê û çavên xwe li bejayê digerandin, bêhêvî lê dinerî.

«Pars ha! Yanî ez ê li ber devê deriyên mizgeftan rûnim û destê xwe ji minafiq û zinêkaran re vekim; ji qewad û qehbikan re bibêjim 'allah îçîndir bîr qurûş' ha! Wey, wey wey!.. Ez nakim, ez nakim, na na na, Xwedê ji ezmanan daxilî erdan jî bibe ez ê nekim!» got û bi berstika qutikê xwe girt, kişand û çirand.

Dilê Nesîmayê bi halê wî şewitî. Ji cihê xwe hilqevizî, bi destê wî girt û hejand:

«Ma hema tu û zarok û Pîrê, ma qey tiştekî ku em jî bikin tuneye! Em deh jinên ciwan di vê malê de ne. Li vî bajarî miheqeq karekî ku em ê jî bikaribin bikin heye.

297

Bibêje Kalo, tu çi bibêjî ez ê wê bikim. Ez dikarim bikujim û bişelihînim û...»

Circîs kêfa xwe pê anî:

«Keça min, ez bi we dizanim bê hûn çi jinên malan e. Lê em li cihekî wilo ketine ku her der wî tije kurmancên derketî bûne. Tu kar ji tu kesî re ne hiştine û hemû jî bi nan û zikê dixebitin. Hesûk ji bo we hindikî li kar û maran ne

geriya. Me qîma xwe heta bi navmalitiya tirkan jî anî, lê kesî deriyê xwe ji me re venekir.»
Jina Hesûk:
«Kalo, heger tu ra lê bibînî ez dikarim parsê bikim.»
Piştî ku çend jinên din jî wek wê gotin, Durê bi wan re xeyidî û çort peyivî
«Jina gava ku li parsê geriya, bixawze nexwaze wê xwe bide jî. Zigurdên bajêr wê qûn ziwa bernadin. Devê xwe bigirin û li cihê xwe rûnin!»
Wan devê xwe girt û Circîs jî li wan nerî û da aqilê xwe:
Durê rast dibêje. Ev kuflet ne mar e ku xwe bi axê bidebirîne. Hin ji me divê li parsê bigerin. Û ev hin jî divê nêr bin. Lê nêr ên min hemû jî hûrik in. Ji van hûrikan çend jê seqet bana bê çi baş bû. Parsa wan mesrefa malê derdixist. Ez çawa bikim? «Durê», got û dengê xwe hilda:
«Em ê parsa xwe bi zarokan bikin. Heft-heşt zarokên me ên ku simît mimît in bê çi quzelqurt in difroşin, bila birakên xwe li cihên qelebalix deynin, durvê seqetan bi wan xînin û ev mesele wê biqede here. Hi, te got çi?»
«Wê zarok ji rûniştina ser betonê nexweş bikevin.»
«Havîn e, tişt nabe.»
«Germa Izmîrê dijwar e, germ dikare li serê wan xîne.»
298
«Bila serê xwe binixumînin. Ma li paleyê jî me wilo ne dikir? Erê me dikir.»
«Ji rûniştinê zarok dikarin emirqesifî bibin. Rûniştina zêde ji zarokan re ne baş e.»

«Bila car carê bi dizî hinekî ji xwe re bimeşin.»
«Nabe, wê nexweş bikevin.»
«Bavo jinik textore jî! Keçê ev te kengî mektebe xwend, lahewlelwela!»
Durê bi haweyekî din bersiva wî da:
«Dibe ku mezin parsê bikin, lê nabe ku zarok parsê bikin. Wê ji wan re bibe tebîhet, Kalo.»
«Ooo tu jî! Ma ez dihêlim ku wî tebîhetê xerab bi xwe ve bigirin. Ez ê her şev li ser neqenciya wê bipeyivim û şîretan li wan bikim.»
«Nabe!»
«Dibe!»
«Na, nabe Kalo.»
«Erê çima nabe, Pîrê?»
«Dibêjin li vî bajarî çeteyek wilo heye ku zarokan direvînin; wan dikujin û hinavên wan difroşin tacirên cihûyan. Û yek jî wan di karê eroîn û meroînê de dixebitîne. Ez çi zanim, gelek tiştên xerab tên gotin.»
Circîs dev li serê zimanê xwe kir û bêhnekê ponijî. Dû re jî:
«Dibêjin ku gelek zarok jî li sikakan destên xwe vedigirin. Qet kesek wan narevîne! Ma çi qewimî, hema wê ên me bên revandin», got û li zarokan nerî.
Durê lê şidand:
«Çima ne tu lê zarok? Tu ji bîra dikî ku ew zarok ji xwîna te ne û kêmaniya bê ser wan, wê bê ser te jî. Qenc
299
bikin xerab bikin, hemû li deftera te a xêr û gunehan tê

nivîsandin. Çawa ku ev li ba Xwedê wilo ye, li ba ebdan jî wilo ye.»
Xwêhdana ruyê xwe paqij kir û destê xwe hejand:
«Bi min nabe, şeref bi min re namîne!»
«Ma gava ku zarok bikin, tu dibêjî qey wê ew şeref bi te re bimîne? Na. Dev ji şerefê berde. Wê ji partiyê re bihêle.»
Bi gotina partiyê re çeng bû! «Heh îcar temam», got û domand:
«Ka em xwe biavêjin 'Derneka Însan Heqlerî.' Ez bawer dikim ku ev însan heqlerî wê bikaribe tiştekî li xêrê ji me re bike. Qet nebe wê qûtê me ê du-sê mehekî deyne.»
Durê bi hêrs peyivî:
«Wey min xweliya heft gundan li serê wan insan heqleriyan kirî! Ma qey ji te werê min hindikî serî li wan da û xwe avêt tor û bextê wan. Ferza min ji te re ne digot. Belkî ez deh carî çûm nik wan.»
«Ê çi digotin?»
«Wek partiyê digotin.»
«Çawa yanî?»
«Digotin ku li vî bajarî bi deh hezaran kurdên li parsê digerin hene. Berî we divê em bi wan re alîkariyê bikin. Him alîkariya wek xwarinê û filan û bêvan ji xwe ne karê me ye. Em karekî siyasî dikin...»
Circîs avêt wan:
«Wilo çilo ye! Siyaseta herî mezin ew e ku mirov karibe zikê insanan têr bike. Derewan dikin. Ew ne ji bo kurdên

me, ji bo tirkên xwe li wir rûniştîne.»
300
«Dev jê berde û serê xwe bi wan re neêşîne. ‘Çavên li deriyan xwelî li seriyan.’ Kalo bi destên xwe xura laşê xwe bixurîne.»
Circîs dîsa bêdeng sekinî û da aqilê xwe:
Ez ê çawa karibim li xwe deynim û bi wî rengî stuyê xwe li ber xelkê xwar bikim? Dinya alem min nas dike, wê kî ji min re nebêje çi. «Na!» got û dengê xwe birî.
Mîna ku Durê di dilê wî de bû, ji dera han dengê xwe lê rakir:
«Belê, belê! Kalo bar ketiye ser milê te, divê tu rahijêyê. Tişt ji tiştan mezintir hene. Ev gotina te ye. Tu fêhm dikî bê ez çi dibêjim, ne wilo? Ji vê bêşerefiyê mezintir bêşerefî heye.»
Piştî ku tam fêhm kir bê Durê li ku dixîne, bêyî ku tiştekî bibêje, wek gule di derî re firiya û berê xwe da nav darên kelehê. Bêhnçikyayî bi destê neviyê xwe girt, «zû min bibe wê sûka qehbik û qewadan», got û lezand.
Nevî jî gotin ne kir dudu; da pêşiyê, xwe bi neqebên kelehê ve berda û berê xwe da Basmahanê.
«Cihê ku em diçinê tu nas dikî, ne?»
«Ma çawa ez nas nakim, Kalo! Ez li vî bajarî heta bi qereqolên polîsan dizanim bê li ku hene û li ku tunene. Em ê niha di ber yekê ji wan re herin.»
«Na na, me dûrî wan bibe.»
«Bila, temam. Kalo!»
«Bêje.»

«Ma ji wir ve îcar tu ê çawa bê? Qey pere bi te re hene ku tu li otobusê û dû re jî li dolmîşa Qelê siwarê?»
«Hene lawê min, hene. Mitalan neke, qey bi şiklekî em ê xwe bigihînin koxika xwe. Bimeşe û me di rêya kin re
301
bibe.»
«Kalo, tu ê cûmek benîşt ji min re bikirî, ne wilo?»
«Ez ê du cûman bikirim.»
«Tatliyekî jî, ne?»
«Erê lawikê min, erê.»
«Û ava lîmonatan jî, hi?»
«Ez ê wê jî ji te re bikirim.»
«Hema qedehkekê. Bi soza mêrên berê Kalo, ez ji qedehkeke piçûûûçik pê ve venaxwim.»
«Na na, bi a herî mezin vexwe.»
«Kalo!»
«Bêjê Kalo bi qurban.»
«Tu ê gokekê jî ji min re bikirî? Hema bila naylonî be jî xem nake.»
«Ez ê wê jî ji lawikê xwe re bikirim.»
«Ku te şekalek ji vanên meqabê jî bikiriya, ê ne tu nizanî bê min ê çawa bi gokê bilîsta! Ez ji hevalên xwe hemiyan jî xurttir im. Kesek ji wan bi min re dernaxîne serî. Gava em dest bi lîstikê dikin û taximê xwe çêdikin, her kes dixwaze ez bibim hevalê wî.»
«Eferim lawê min, eferim!»
«Kalo...»
Ne hişt ku lawik bêje.

«Lawo, çi perekên ku li ser min hene, ez ê hemî li te xerc bikim», got û destê xwe avêt bêrîka şerwalê xwe. Perê wî hemû pêncî hezar bû. Dirêjî destê wî kir. Lêwik jî piştî ku baş li wan nerî, kulma xwe li wan hişk girt, «Kalo bi van pereyan tiştek nayê», got û bêdilî xwe lezand.

Ji serê keleha Kadîfekaleyê heta Basmahanê bi meşa

302

mirovekî di tayê Circîs de, nîv seetek bû. Lêbelê wan di hikmê bîst deqîqeyekî de xwe gihandin nav sûka wê jî. Ev cara pêşî bû ku Circîs dadiket nav bajêr û bi vî haweyî bajar didît.

«Lawê min, ka bisekine», got, lawik sekinî û wî li derdora xwe nerî.

Bi dîwaran ve memikên daliqyayî û şeqên ji hev vekirî hebûn. Ên hinan jê ew jî xuyanî dikir. Kelefên qûnên sosyetên Beyoglû, Tarlabaşi, Bodrûm û Marmarîsê, mîna felqên zinaran bi avaniyan re bilind dibûn. Sîha ku ji bedena wan dikişiyan sûk û kolanan, di ruyê erdê de hilm vedida û di xwîna ên ku diçûn û dihatin de digeriya. Pîrek û zilamên çîmrût bi kûçik, boncîk û pisîkên xwe ve digeriyan. Jinên pêxêl vekirî li sikakan diçûn û dihatin û li qehwexaneyan, aşxane û parkan rûniştîbûn. Ên bi fotêr jî hebûn. Dengê kenê qehbikên Basmahanê di ser serê bajêr re derdiket. Cengeneyên wê dîsa li sikakan, nîvtazî di ber cumbuş û teblikan re dansa xwe dikirin; distiran û qedehên araqa xwe li bin guhê hev dixistin. Jin di sênga mêran de xilyayî ketibûn.

Bêhna kebaban û goştê biraştî hawêrdor difûriya. Ên lahmecûnan jî. Felqên peqlawa rangareng, di refên camkirî de rêz kirîbûn. Keç û xortan li gasînan devê xwe dixistin hev, xwe li hev radipêçan û dibûn yek perçe. Di camekanan de, derpî û sudyenên ku ji hevirmêşê û bi tenteneyan veketîbûn, bi gul û gulbendên xwe mîna kulîlkên ser gorên generalên herêma wî, hawe bi hawe bûn. Bodra, şodra û şûşeyên boyaxa lêvên jinan, peykerên jinên şilfîtazî, perûkên homoseksuelan, lezbiyen û zeriyan û gelek tiştên wek van jî hebûn. Û di nav vê gengeşiyê de jî melê
303
bang dida. Circîs mabû ecêbmayî! Ew devê wî ê ku hilma genî difûrand, çûbû pişt guhên wî. Ev hemû jî misilman bûn û misilmaniya yekî ji wan jî ne dişibiya misilmaniya wî û miletê wî.
Bêyî ku li ber xwe binere wek dînan meşiya. Piştî çend gavekî li hindama fûarê car din sekinî:
«Berxê min», berxê wî mabû pê re heyirî, «bi destê min bigire; eman em hevdu winda nekin!» got û bi wan çavên xwe ên ku di wextekî de bi tenê sînorên erdê xwe ji hev difesilandin, li cihê ku dengê bangdana melê dihat nerî. Lê hema pê re jî xwe ji bîra kir, dîsa çavên xwe li derdora xwe gerandin û dev lêvên xwe kirin.
Izmîrê bajarekî pir bi qelebalix bû. Li vir mirovên ku kurfê zikê wan ji tûrê nav bîstanê wî mezintir bûn rûdiniştin. Serhejmara niştecihên kolaneke wê bi qasî hejmara kesên herêma wî pir bûn. Û bi ser de jî li vir kesî mala kesî xerab ne dikir. Kesî mîna wî û xelkê wî ranehiştibû tivingê

û li ber hev pahn ne bûbûn. Û heta bi tenê li gundê xwe jî ne fikirîbûn. Li hevdu fikirîbûn, dest dabûn hev û bajarê xwe, di teşbîhê bihuştê de xweş û sipehî kiribûn. Her der bi dar û şînahî bû. Circîs di warê welatperweriya xwe de, niha ji berê bêhtir bi xwe hisiyabû. Xewn û xeyalên xwe ên zebeş û petêxan, bêndera ceh, genim, nîsk, nok, garis, şolik û kizinan bi carekê ve ji bîr kiribûn. «Heyhat!» digot. Lê heger «heyçû» bigota, belkî ewqasî neêşiya. Mirov digot qey ji qesêb hûr û rovî û ser û pê kirîbûn; her mirovê ku di ber re diçû, dilê xwe jê dixeland û tif dikir erdê. Heger pirsyana tiştekî ji hinan bikira, sedî sed wê kesî bersiva wî ne daba. Û heta belkî tifî ser dev û ruyê wî jî kiribana.

304

«Lawê min, me bibe wî cihê ku mela bang dida», got û li ber xwe nerî.

Ser çementoya ku ji kincên wî û heta ji ruyê wî jî paqijtir bû, bala wî kişand. Dil jê ne hat ku bi sola xwe bide ser. Li wê navê rûnişt û li solan xebitî. Lêwik fêhm kir ku kalikê wî dixwaze xwas bimeşe.

«Kalo, sola xwe têxe lingê xwe; wê xelk henekên xwe bi te bikin.»

Dirêj ne kir.

«Xebera te ye lawê min», got û rabû ser xwe.

Lêwik bi destê wî girt û berê xwe da ser rêya Tepecîkê.

«Aha bihuşt ev e ha! Û cehneme jî welatê me ye!..»

«Kalo hêdî hêdî bipeyive. Xelk li me dinerin.»

Bi a lêwik kir.

Qederê pênc deqîqeyekî meşiyan. Pişt re jî li hindama sînemeyê sekinî; xwe bera erdê da û ji xwe re li insanan temaşe kir. Êvar bû û insan jî mîna gêrikê diçûn û dihatin. Û bi ser de jî yekî bi demaçe di nav wan de tune bû. Çavên wî mîna du tasan vebûbûn. Mirov digot qey stuyê wî ji serzîlan ketibû, serî li ser mil paldabû.
Eskeran li nav bajêr xuyan ne dikirin. Terempêlên wan jî. Di qorzîbirên kolanan de kozikên ji torbê qûmê tune bûn. Polîs û tîm li dikanan ne rûniştîbûn. Ne dengê sîlehan û ne jî dengê xije xija helîkopteran di ser bajêr re dihat. Çirûskên êgir ji ezmên ne diçûn. Ji her derê ezmên teyrik û tilûran xuyan dikir. Tenq ne dibihurîn. Panzêran pê li kesî ne dikirin. Ji xwe mirov nizanîbû ku henin. Insan di nava xwînê de ne digevizîn. Kes ne digiriya, kesî ne dikir hewar hewar! Pîrekekê jî ne li sênga xwe dixist, ne porê xwe dikişand û ne jî diavêt ser kuştiyekî. Terempêlên ku li
305
ser pişta wan tabût girêdayîbûn ne diçûn û ne dihatin. Doc û qemyonên ku cendekên insanan, mîna pezên gurandî bi wan ve daliqandîbûn, li kolanan ne digeriyan. Ên ku bi pêşiya wan ve nanekî kilorî daliqandibûn jî xuyan ne dikirin. Ne lingên zer ji bexacên texsiyan bi erdê ve dikişiyan û ne jî ji bexecan xwîn bi erdê ve diherikî. Polîsên ku li Nisêbîna wî bi bombe û keleşkov digeriyan, li vir hew bi demaçe bûn. Di sûkê de ne kes dikuştin û ne jî kesek didan ber pêhîn, kulm û şiqaman.
«Wey li aqilê min û bavê min be! De bixwe tiro! De wilo di nav vê sefaletê de bimre, bimre!... Hey ne tiştek!...

Ew çawa aqil bû ku min û Heso, me li ser terîşkeke erd dinyayek mêr ji hev kuşt! Waweyzê, waweyzê!... Me temamê malê xwe li devê eskeran qeliband, kuro! Ji bo ku me hevdu pîs bikira, me qîma xwe heta bi xwarina gû jî anîbû! Û me xwar jî. Me ji destê usteymenê ser hidûd ew pîsî ne xwar qey? Belê, belê! Û him jî çawa! Wey xwelî li serê min û bavê min be! Ê erê ma bi tenê ez û Heso, omerî, torî, xerzî û botî ji me jî beredayitir bûn, bavikê mino! Em kurmanc miletekî xerab e û xwedêjêstendîne, weh! Em ji ber xwe fedî nakin. Îcar mirovê dema ku ji ber xwe fedî ne kir, wê qîma xwe bi her pîsiyê jî bîne. Ma ji vê bênamûstir çi heye ku mirov dev ji zimanê bav kalên xwe berde û zimanê tirkan têxe devê xwe! Ê van kurmanckan xistiye devê xwe, ma derew e, hi? Kuro de me zilm heq kiriye, lo. Hema çi bikin ji me heqê me ye. Em insan in ku wek heywên tevdigerin. Heywan heta ku birçîne be, li xwarinê nagere. Îcar gava ku birçî dibe, bêser û ber xwe li her tiştî diqelibîne. Me jî her tim wilo kiriye. Û em hîn jî dikin. Howeh howeh, kes ji me li pêşiya xwe ne fikirî! Sarê bi

306

carekê ve aqil bû. Ji me û bavê me jî bi aqiltir bû! Her tim xêrxwazî dixwest û berê me dida van teresbavên tirkan. Wey, wey, wey, bê me çi bi serê xwe kiriye!» got û bi wahc rabû ser xwe. Mîna dînan meşiya, destê xwe bi vir de û wir de li bakir û heta ku jê hat dengê xwe hilda: «Kurmanco, kurmanc, kurmanc! Qaçtî, qaçtî, qaçtî! Ha ha ha!...»

«Kalo, Kalo wilo nebêje! Binere wê dû re polîs me

bigirin û me têxin hepsê!» got û destê xwe li ser dev û ruyê wî gerand.
Li sihûd û qubala wî ku him zû qut kir û him jî navê miletê wî kurmanc bû. Heger peyvika «kurd» gotibûya, dibû ku bihata kuştin. Bi lêdana ji destên xelkê li wê navê, çend kesên ku mîna wî qêriyabûn, li Izmîrê hatibûn kuştin. Tew li Stenbolê, ji koma jin, mêr û zarokên ku li sikakê «bijî kurd û Kurdistan» gotibûn û ji ber tirkên sivîl reviyabûn hindurê kilîsa ermeniyan û mizgeftê, pîrekî di hindurê mizgeftê û zarokekî jî di hewşa kilîsê de bi lêdanê can dabû.
Circîs bi ser hişê xwe ve hat û bêdeng meşiya. Mizgefta Yenîşehîrê jê û hema bi wir de bû. Û ji mizgeftê jî bi wir de pavyon, bar û dû re jî ew kerxaneya bi nav û deng dihat. Kerxaneya Tepecîkê.
Insanan mîna keriyên pez xwe ji kolanan berdidan nava sûkê. Yek li yekî ne diket, yekî yek ne didahfand, şiqamek ne diavêt hev û bê his û pis bi rêya xwe de diçûn.
«Bê çi qasî ji hev re baş û bi tifaq in. Mirov dibêje qey hemû şîretkirîne, wek pez dimeşin kuro!...»
Lêwik dabû pêşiyê û ber bi mizgeftê de diçûn. Piştî ku gihan ber deriyê mizgeftê û bi dîwarên avaniyên himber û
307
kêlekên wê ve sûretên jinên tazî dîtin, dîsa xwe aciz kir û dengê xwe hilda:
«Wey, wey, wey! Ev çawa misilmanî û xwedênasî ye? Ev çi çîmrûtên li ber vê mizgeftê ne? Ji Xwedê natirsin, ji pêxember fedî nakin! Baş e, miftiyên bajêr û melayên

mizgeftê çima dengê xwe nakin gelo? Xelk nabîne qey?
Ew çima qîma xwe bi vê gunehkariyê tînin? Dewlet çima
rê dide vê bêexlaqiyê?...»
Lêwik jî bi haweyê ku ber dilê wî bigire, bi kêf gotina
wî birî:
«Kalo, ha ewa han jî pavyon e. Ewa ku em di ber re
hatin jî sîneme bû. Û haaa ewa han jî, kerxaneya ku xalê
min Cidhan diçûyê û ji hevalan pere distend, ha.»
Circîs ponijî. Çawa ponijî wilo jî ruyê wî pê re gewirî.
Destê xwe bi wê navê de hejand û heta ku jê hat dengê
xwe hilda:
«Me li xwe danetanî ku em bi araqvexwirekî re bipeyivin.
Keçên me ji tirsa me, newêrîbûn li xortekî bineriyana.
Hema çi bikirana ji hev bila bikirana, wey bimir,
waweylê! Ma ne herdu alî jî ji me bûn, ne bacolî bûn, lo;
em kurmancên hev bûn, hi? Ê hew! Û li vê derê jî kerxane,
parxon, sîneme û mizgeft cîranên hev in, kuro! Û bi ser
de jî hemû bêteq û req karê xwe dimeşînin, waweyzê!»
Sekinî, bêhna xwe berda û vê carê jî bi haweyê ku xwe
haş bike wek êgir pê de çû:
«Yabo qurbano partî jî wilo bû. Partî, partî, partî! Û
heta ji me xerabtir jî bû! Erê, erê, ji me xerabtir bû! Hema
çawa ba, me kesek li ser araqa ku vedixwar bi pereyan ne
cirm dikir û ne jî dikuşt. Erê me ne dihişt ku keç û xort
xwe di hev werkin, lê me zewac jî li wan qedexe ne kiri-
308
bû. Me jinên xelkê ji wan bernedida. Me livîna mêr û jinê
ji ber hev ne digirt. Ma dibe ku jin û mêr nek... tobe estexfîrullah!

Kuro vê partîkê em ji rengê insanetiyê derxistibûn!
Ew çi şikil bûn!...»
Di vê navê re xortekî jî pêncî hezar avêt ber û bi rêya xwe de çû. Circîs xwe winda kir. Piştî ku rahişt kaxeta pêncî hezarî, bi gezan tîştîşî kir û kela wî dîsa hênik ne bû, da nav qelebalixê û çi hat ber devê wî got:
«Ji xwe re li wan binerin kuro, bênamûsino, ma ez parsekê ber devê deriyê bawê we me ku hûn van perekan diavêjin ser min, hi! Ez Circîs im, Circîs! Ez ew Circîsê ku qomandarê we dide ber derbên xinceran. Min serê xwe ji wî Atîlla re ne tewand! Min bêrîka mezinên we tije pere dikir! Keleş û parsek û hemû tiştên ne tiştek hûn in!...»
Bi vê bêhntengiyê berê xwe da malê û kerba xwe a mayî, vê carê jî di serê Durê re derxist.
2
Parsa Circîs jî mîna koça wî dereng ketibû. Heta sê-çar sal berê jî çeteyên bajêr ji parsekan xwîk ne distendin. Lê piştî ku kurdistanî li Tirkiyê belav bûn û li bajarên wek Izmîrê û derdora wê bi sed hezaran bi cih bûn, çetayetiyê jî li van bajaran tam rû da û bi her haweyî bajar li hev payê kirin. Hema hema temamê vê çetayetiyê jî wek ku Fermên digot, kurdan dikirin. Circîs bi vê yeka han dizanîbû. Lê nizanîbû ku çeteyan heta bi sûk, kuç û kolanên bajêr jî li hev payê kirine. Durê jî nizanîbû. Dîsa li gora serê xwe kir. Û nedîtî nebînayî, li ber deriyê mizgefta Yenîşehîrê bi nîvrokî re rûnişt û paçikê xwe ê parsê vekir. Di roja pêşî
309
de digel ku du milyonek bi dest xist, li tu xwîxuran jî rast

ne hat. Lê di adin î rojê de jê re wilo ne serifî. Bi esirkî re beleya ku ne li bendî bû, ji nişkê ve di bere derket û xwe dadayê.
Xîpekî zilaman, birhûqalind, guhçaroxî û serşûnikî pê ve bû benîşt û jê venebû. Çavên wî ên beq, di nava serê wî de dilîstin. Bedlekî şîn li xwe kiribû û qerewateke kesk girêdabû. Qundereya di lingan de mîna qîrê reş û ewqasî jî dibiriqand. Lê dîsa jî diruvê eşrafên bajêr pê ne ketibû. Bi porê xwe ê gijikî, simbêlên qalind î sertûj û rîha xwa a ku mîna perên jojiyan kişiyabû, ji eşrafan bêhtir, şibiyabû pêxwas û qewadên Basmahanê.
Bi hemd xwe bi ser Circîs de tewand, mahdê xwe tirş kir û bi teqil pirsî:
«Tu sofiyê kîjan tekiyê yî?»
Circîs guh lê ne kir. Wî dîsa wek a niha got. Lê bi hêrs. Circîs dîsa deng ne bir xwe. Mêrik mîna marê ku di qulê de mirov darikan tê rake, kufînî pê ket, ricifî, xwe li hev zîvirand, serpozika qundereya xwe da bin paçê ber û paç tev li pereyan bi wir de heliqand. Dû re jî xwe da ser çongan û destê xwe lê hejand:
«Qeşmer, ez bi te re qise dikim, cewaba min bide! Ez diçirînim û bi daran ve dadiliqînim! Ez cûm bi cûm dikim û ji masiyên behrê re davêjim! Ez dişewitînim û li ber bê berdidim! Rezîl, rezîl, tu sofiyê kîjan tekiyê yî, zû bêje, bêje!...»
Circîs bi xov serê xwe rakir. Tirsiya. Him jî pir. Heger dengê wî ewqasî ne qalind bûya, dibû ku Circîs jê ewqasî ne tirsiyaba. Xwest ku xwêziya xwe daqurtîne; xwêzî di

ber de ma. Ziq lê nerî û mîna parsekan peyivî:
310
«Ez feqîrekî Xwedê me. Ji xwe re parsê dikim. Dinyayek kuflet di stuyê min de ye. Ez ne sofiyê tu tekiyê me.»
Bi mêrik ecêb hat. Di cihê xwe de sar bû û sar jî got:
«Çima qey tu ne mirîdê terîqetê yî ku tu vê paroleyê nizanî?»
«Mirîdê çi, terîqeta çi, petrola çi, ev tu çi dibêjî? Ma li vî welatî tu terîqet hene qey?»
Vê carê jî xwe bi ser de zirzitand:
«Wisa xuyaye ku tu kurdekî xayin î, xayin! Ma li vê dinyayê kesekî ku partiyê nas nake maye qey. Tu nas nakî ha! Tu ne endamê partiyê yî, hiii», got û bi pêxêla wî girt û hejand.
Qirçîn ji nava Circîs hat. Di meseleyê de giha; dev li qurmê zimanê xwe kir û di hindurê xwe de piçpiçî. Destê xwe danî ser şilfika kêra xwe. Kêr di bêrîka çakêtê wî a hindur de bû. Di vê rewşê de piştî ku hilmekê ponijî û di ber xwe de got «tamam, ev jî ji wan e», dengê xwe hilda:
«Partiya me, haaa! Ma çawa ez ne endamê wê me! Ew ronahiya herdu çavên me û taca serê me ye. Em bi wê hene. Wê ez rêyî vir kirim, wê, wê!...»
Mêrik sist bû, lê dîsa jî dengê xwe bi ser ê wî xist û bi bêhntengî got:
«Navê şêxê te çî ye, şêx?»
«Şêx Fermanê Torî.»
Wî şêx nas ne kir.
«Baş e, tu ji kîjan tekiyê yî?»

«Ez ji tekiya Ozgurluk Koyî me.»
Piştî ku gund nas kir, hinekî zor da xwe ku kubar bipeyive.
Lê heq jê derneket.
«Navê te çî ye?»
311
«Circîs.»
Navê wî pê xerîb ne hat.
«Baş e, baş e», got û hinekî jê dûr ket.
Piştî ku bi telefona xwe a destan qederekî peyivî û telefon girt, keniya. Dû re jî tena tena hat û eskerkî di ser re sekinî:
«Bêşa xwe a îro bide û em ê dû re bi te re qise bikin.
Lê gerek te zanibûya ku tiştek ji çavên partiyê narevin.
Partî mîna melekên rehmê û xezebê, li her derê hazir û nazir e, pîroyê qûrnaz. Û bi ser de jî bi partiya gelê kurd re dijminayî, ha!»
Perê parsê bi Circîs şêrîn bûbû. Di eslê xwe de wî ji çi tiştê ku wek keda xwe dizanîbû, hez dikir. A wî ev bû. Ji ber hindê bêhnekê da aqilê xwe ku bêşê nede. Dan ji nedanê çêtir dît, taxek pere ji bêrîka şerwalê xwe derxist, «amentû billah, partî li her derê hazir û nazir e!» got û bi qehr da dest.
Mêrik xwe aciz kir. Bi serê zimanê xwe serê simbêlan bi hindur de kişand. Cût û got:
«Çi, yanî ne wisa ye qey? Ma tu ji ber partiyê xelas bû, pîro?...»
Circîs jî bi zirt a xwe got:
«Zirt virtê neke, bihejmêre û bêşa xwe hilîne û hew!»

Bi hêrs rahiştê. Milyonek û sê sed hezar û tiştek bû.
«Ez ji van pereyan radihijim heft sed hezarî, temam!»
got û perên mayî heliqandin ser.
Circîs jî hema wilo yekser, bêyî ku tiştekî bibêje, nîvê
wan xist bêrîka xwe û nîvê din jî dirêjî destê wî kir. Lê wî
him ne girt û him jî gotina xwe a dawî got:
«Circîs axayê bûblanî, partiyê ji te heqê xwe zêde sten-
312
diye. Ew ên te ne. Têxe bêrîkê û parsa xwe dewam bike.
Zêde neke.»
Circîs xwe zewirand û bi zor rabû ser xwe. Him çongên
wî qerimîbûn û him jî nava wî tije wahc bûbû. Dilerizî.
Hema xwe li ser pêyan digirt. Li herdu çavên wî nerî û
tena tena got:
«Ez bi dana van pereyên vî karê xwe ê bêrûmet, dixwazim
li ba partiyê bi rûmet bibim û gunehê tarîxa liberxwedana
xwe sivik bikim. Bigre!»
Ne girt û soro moro bû.
«Kûçik tu çi dibêjî!» got û heta ku jê hat pehîna xwe li
defa sênga wî xist.
Bêyî ku deng ji Circîs derkeve, bi pehîna wî re rimekê
bilind bû, li dîwêr ket û serserkî hate xwarê. Pêşî melûl û
melûl li xwîna xwe nerî. Xwîna wî a ku di dev û bêvilê re
dibeliqî ser çementoyê, di rengê sînorê welatê wî de li hev
digeriya. Dû re jî hûr û kûr li wî nerî û devê xwe vekir. Zor
da xwe. Lê argûşkan bi a wî ne kirin. Di dawiyê de lêvên
wî lebitîn:
«Heylo weylo xwelî li sero, bi min xurto, li min xurto!

Erê looo, ez bi destên we bûm şîva tirkooo! Lê ji bîra nekin ku hûn ê jî bibin paşşîva wan, lawo», got û zimanê wî nema geriya.
Zorava hate ber çavan û him û gima qesra wî di guhan de olan da. Civat lê civiya. Perîxanê li ber destên wî çû û hat û vê carê jî serê wî danî ser kaba xwe û xwe lê pêça. Sarê qîr dayê, «Circîsooo! Ma tu ê wî kufletê giran di stuyê kê de bihêle, looo! Na na naaa, li ber xwe bide! Kuro tu kurmancê herî mezin î, na gidîîî!...» Bi dengê wê re, dilê wî ê ku di êş û mereza qernekî de hatibû guvaştin,
313
mîna bixurê şewitî. Çavên wî şil bûn. Li çiyayên Omeriya nerî. Çiya jî li hev kom bûbûn, xwe bi ezmên ve daliqandibûn, baweşînk lê dikirin û ji perên xwe melhem diherikandin birînê. Lê fêde ne kir. Da xwe ku wan bêhn bike.
Destê rastê hinekî lebitî. Û wî jî bi wî destî, xwest ku hêsirên xwe bi keziyên dar û deviyan, gul û gulbend û nêrgizên bihara çiyayên xwe paqij bike. Lê ne kir. Ji nişkê ve lerizî û hema pê re jî çavên wî xav bûn û li hev qulipîn; ji dest xwe çû û xiliya. Circîs çû! Circîs çû û çû! Ne Zorava xwe, ne ew çiyayên xwe ên şêrîn û ne jî çimekî welatê xwe careke din dît û çû. Lê dîtiba wê bûba çi? Ew tarîxa ku di çerxa welatê wî de bi ava lêvên kurdên jar û hejar geriyabû, ji zû ve ziwa bûbû. Û ew zemanê ku di ezmanê welatê wî de xwe bi rivînên jana kezeba welatperweran qemirandibû, sar bûbû. Li temamê bakurê welêt ne di binê zindanan û ne jî di kozik û çeperan de dengê navtêdanên fêrisên wî dihat. Bi tenê hew dengê hêsîriyê, care car û

hewaran! Û qezetoreyên ku di bin barê zilmê de hinavên hêsîran diterişandin. Li wî ezmanê Botana ku tije baz bûn, zerzûl difiriyan. Kundan li gundên wêrankirî dixwendin û di nav biharê de jî keriyên wawîk û berazan girtibûn. Wawîk û berazan xwe berdidan heta bi nav Zorava wî. Êdî ne ezmên bi agirê xweşkêş û çapiliyên çekdaran ronahî dida û ne jî çerxa tarîxa welatê wî bi hinera zend û bendên wan digeriya. Ji her malê dengê axîn, keser û nalînan bilind dibû!...

Li Qamişlê tîrêjên roka ku xwe dadabûn kêla ber serê Reşoyê Sarê û Menca Xerzî, di çiyayên Botanê de berqefa ku bûbû stara hestîkên Serdêr û berqef di nava ronahiyê de hiştibûn, li Stockholmê rast kişiyabûn ser gora

314

Seydo û di ezmanê Izmîrê de li ser cendekê Circîs çirûsk vedidan. Ji çavên wî ên vekirî û devê wî ê ji hev, xuya dikir ku dixwest hîn pir û pir bigota. Lê her tişt bi dawî bûbû û ew çemê jîn û jiyana di dilê wî de, li ber dîwarên xerîbiyê, li sûka qehbik û qewadên Basmahanê, carekê sekinîbû û tu carî jî wê nema biherikiya!

315

XEZEBA AZADIYÊ

Laleş Qaso

XALÊ MIN FERÎD

Paşa Uzun

Kitêb: 18

Biyografi: 1

Xalê Min Ferîd
Paşa Uzun
Çap: Berdan Matbaacihk
îstanbul, Tebax 2006
Edîtor: Deniz Gunduz
Redaktor: Roşan Lezgîn
Mîzanpajçêker: M. Alî Variş
Grafikçêkera qapaxê: Nuran Gundoxdu
© Paşa Uzun
ISBN: 975-6278-09-9
Weşanxaneyê Vateyî
Adres:
Katip Mustafa Çelebi Mah.
Tel Sok. No: 18 Kat: 3 Beyoglu/ îstanbui
Tel: 0212-244 94 14
E-posta: kovaravate@yahoo.com
Ji Ruhsar û Yekbûnê re.
Ezji bo alîkariya wanji Ruhsar Uzun, Sakîne Uzun,
diya min Seadet Uzun, Ahmet Belet, Adem Avcikiran,
îbrahîm Kureken, Mustafa Aksakal. Eyup Surek,
Sîno Xurşîd, Zinarê Xamo, Ahmet Guleken,
Remzî Kerîm, Mistefa Uzun, Malmîsanijî
re spasiyên xweji dil pêşkêş dikim.
Pêşgotin
Ji kuştina Ferîd heta niha27 sal derbas bûne, gelek însan bûn guhdar û şahîdên gelek tiştan. Devê xelkê ne çewal e ku mirov bidirû û çavên xelkê ne mumkun e bêne gêridan. Her kesî tiştek dît, tiştek bihîst û her kesî gor dîtin û baweriya xwe tiştek got.

Her kesî ciyekê nîşan da, gor hinekan mêrkuj ji aliyê çepê bû, gor hinekên din jî axa û kevneperest bûn.
Li ciyêk wek welatê me bûyerên wisa zû bi zû ji holê ranabin. Guhertina nivşên kevn zahmet e, civaka me ji bo kelmêsekî dikare zarokên xwe bi xwînsarî û hovitî qetil bike û dike jî.
Divê di jiyana me ya cîvakî û siyasî de gelek tişt bên guhertin.
E herî girîng, divê em di mejî, dil û wîcdanê xwe de qîmeta canê însanan hildin ciyekî bilind û muteber. Di edebiyat, şîîr, kilam, senat, sînema û mekteban de vê meziyetê di mijûyên nivşên nû de bineqişînin. Ger em bikaribin zarokên xwe bi meziyetên însanî mezin, terbiye û hîn bikin, wê gavê rojepêşên me zêdetir ronahî bin.
Milletekî wek me reben, belengaz û bê xwedî divê vê prensîba hanê rake ser serê xwe, ji xwe ra bike rêber, wîcdanê xwe bike mehkeme. Di mahkema wîcdanê xwe de li hember mêrkujî û brakujiyê derkeve û fiêlên wisa mahkûm bike.
Heya nuha hem wek ciwat û hem jî wek ronakbîrên welatekî bindest me di vî warî de îmtihanekî baş nedaye, axlaqekî hember mêrkujî, birakujî avakirin tu caran di bemama me de cîh negirtiye.
Milletê ku nikaribe li miriyên xwe xwedî derkeve, ew ê çawa li saxan xwedî derkeve?
Yê herî xirabtir, gelek ronakbîr û siyasetmedarên me, dem bi dem li gor bayê, ebe û cubeyên xwe dugeherînin, destên xwe dixin nav destên mêrkuj û brakujan, bê fedî û bê ar xwe wek pêşverû û welatxelasker ji xelkê re pêşkêş dikin.
Pêwestiyekî wisa giran em ê kengê bidin ber xwe jî hîn ne bellî ye. Bes mêrkujî û birakujî berdewam e, delalên wek Ferîd,

wenda bûn û wenda dibin, sal tên sal diçin, bes siya mirinê li ser zarokên milletê me winda nabe, her ku dere tarîtir û girantir dibe. Hêviya min ev e ku dûr an nêzîk, yên ku biryara kuştina Ferîd dabûn, di huzûra milletê me da bên mahkûmkirin.
Bes Ferîd paş da nayê, birîna dilê Ruhsarê rehet nabe.
Gava ez dest bi nivîsandina vê kitêbê dikim, êdî 27 sal derbas bûne. Cara yekemîn ez diçim ser mezelê Ferîd, hevalên wî jê re mezelekî xweşik çêkirine, li ser kevirê sipî sala bûyina wî hatiye neqişandin.
Gava ez li ber mezelê wî disekinim, dixwazim ew rabe, qet nebe ji min re bibêje;
- Tu ji bo çi ewqas dereng mayî?
- Te ji bo çi li halê min nepirsî?
Deng ji wî nayê, serê min dikeve ber min, ez digirîm.
Ferîd tê dinê
Her cara ku diya min behsa serpêhatiyên xwe yan behsa bûyeran dike ez mat û heyran dimînim. Di gotinên wê de wext nîn e; ne saet, ne meh û ne jî sal... Wek em hemû însan di wextek bê serî û bê binî de dijîn, mesafeyên di nava bûyin û mirinê de wenda dibin. Diya min heyşt zarok anîne dinê, lê kîjan rojê an kîjan mehê zariyên wê çêbûne ne ew û ne jî kesekî din dizane. Xwedê bi rehma xwe şa bike, apê min Hesen tarîxa bûyina zarokan bi destnivîsa xwe li paş resmekî ku me xistibû nav çarçoveyek û bi dîwarê odê ve bi dar da kiribû, dinivîsand. Gava ez ji hefsê derketim ew resm jî wek gelek tiştên din wenda bûbû. Ferîd di bihara sala 1945an da tê dinê, bes ez dixwazim ji devê diya xwe guhdariya bûyina Ferîd bikim.
Ji rojan rojekê, biharê bi giraniya xwe çarşefeke şîn li erdê

Swêregê raxistiye, bîhna kulîlk û nefelan daketiye ser Swêregê, diya min û xwungên wê li Helawikê, li nav bîstên dendikên zebeşan diçînin. Xebera xêrê digîhîje bîstên ku dakê Kejo lawikek aniye dinê. Navê Ferîd li lêwik dikin. Beriya Ferîd sê
10
keç û sê law hene, Ferîd dibe zarokê heftan, êdî li pêy Ferîd dakê Kejo zaro çê nake. Ferîd dibe zarokê dawî, dibe şîr û şekirê malê. Ew dibe zaroyekî biharê, zarokê kulîlkan, nefelan, giyayên êşîn. Sirûştê, serma û seqema zivistanê li dû xwe berdabû, dar û daristan, gul û kulîlk bi darmêwan ra tev bi çîçekên rengareng rabûbûn ser piyan, Ferîd jî bi wan re çavên xwe li biharê vekiribû û bi biharê re jiyaneke nû, jiyaneke teze û xweşik dest pê dikir. Dilpakî, biratî û hevaltiya wî wek bîhna nefelê, bîhna darên sincan ji der û dora xwe re, ji bav, bira û xwungên xwe ra, ji heval û dostên xwe ra germayî, xweşî, ken, henek û dilgeşiyê bela dike, bi eşqa dilê xwe dilê wan jî geş û xweş dike.
Wê demê dayikên me, zarokên xwe li mal tînin dinê, pîrên mehelê yên zane û xwedî tecrube alîkariya dayikan dikin. Zarokên der û dora mehela me bi destên meta Gulo, Zuloya Cana û Altûna Çavişan tên dinê. Gava jana dakê Kejo dest pê dike Zuloya Cana ne li mal e, ji ber wî yekê ban Gula Delî Eliya dikin, di şûna meta Zilo da Gulê dibe pîrika Ferîd.
Gava çelê Ferîd xelas dibe, dinêrin ku nigên Ferîd xwar in. Apê Sefo dibêje, emê lawikê nigxwar çi bikin, herin Abdullahê Botî bînin, bira derziyekê li vî lawiki xe ku lawik bimire. dakê Kejo ban pîrika min Bêzê dike. Bêzê dayika bavê min e, ew jî dimilî ye, gava ew û dakê Kejo tên ba hev bi hev re dimilî qise dikin. Bêzê dibêje, "Kejo, ev lawikê ha, te çewt pêçaye ji ber vê

yekê lingên wî xwar bûne. Ez ê wî bi babetekî dinê bipêçim ew ê lingên Ferîd rast û baş bibe." Û wisa jî dibe. Demekî şûn da lingên Ferîd wek spîndaran rast dibin.

Diya min xwunga Ferîd e, ji Ferîd mezintir e. Diya min û bavê min di yek şevê û yek saetê de tên dinê. Gava salên wan

11

dibin sêzdeh dergîstî dibin, çardesalî dizewicin. Sala ku diya min dibe bûk Ferîd heft, heyşt mehî ye, çile ye, serma û berf li erdê ye. Di salên 40 û 50yan zivistanên Swêregê wek niha nerm û germ nîn in, sermakî xurt hukum dike, berfa ku zivistanan dibare bêhêsab e, derî û paceyên xaniyan di bin berfê de dimînin. Di zivistaneke wisa giran, bi serma û seqem de Ferîd hevt mehên xwe tije dike, bi meş neketiye bes bi çarpiyan dimeşe.

Navê pîrika Ferîd Zeyno ye. Me jê re digot "Pîro", Ferîd jî di nav de, em hemû bi çîrokên Pîro mezin dibin. Di wê demê de televîzyona me kesekî tune, radyoyeke bavê min Hesen heye, lê belê kêfa me zarokan ji radyoyê re nayê, bi taybetî şevên zivistanan em hemû zarok diketin bin kursiyê û bi matmayî me li çîrokên Pîro guhdarî dikir. Çîrokên ku Pîro ji me ra digot, ji sînemaya HoIlywood jî wêdatir bûn, her çîroka Pîro wek neqşên dolbendên serên dayikên me, di nava mijûyên me da ciyê xwe digirt.

Ji diya Ferîd re me digot "dakê Kejo", navê wê yî rastî Kezîban bû.

Zaroktiya xwung û birayên min Sakip di navbera mala me û mala xalo Ferîd de derbas dibû. Dema ku em ne li mala xwe bûn, dihat wê maneyê ku em li mala dakê Kejo bûn. Li gor diya min dakê Kejo ji Dêrsimê bû, kengê ji Dêrsimê hatine Swêregê, ji bo

çi hatine ez nizanim. dakê Kejo dimilî, kurmancî û piçek jî tirkî dipeyivî. însaneke pir sosyal, bînfireh, û suhbetxweş bû. Gava niqare û zime lê diket zû bi zû xwe nedileqand, divê yekî piyê wê bigirta bikşanda nava govendê. Beriya ku rabe ser xwe, ji bêrîka xwe qutiya enfiyê derdixist, piçek dixist nav du tiliyên xwe û dikşand pozê xwe û li govendê ciyê xwe digirt. Wek li ser
12
ewran bilîze, te di got qey lingên wê nagîhîjin erdê. Bejna kinik, lingên sivik wek têlên tenbûra Ferîd dilerizîn.
Apê Sefo bavê Ferîd e. Di jiyana me hemûyan de ciyekî wî yê taybetî heye. Li gora dema xwe pir pêşda ye. Xeybetên rojane, teq û req û teşqelên eşîrî li ba wî tunene. Insanekî henekxweş e.. Rojekê li Mêrgehmedê, li ber yazixana Otoşarkê bi pîrika min dakê Kejo re rûniştiyê û li benda bav û xwunga min e. Bavê min û xwediyê Otoşarkê, îhsanê licêyî hem heval û hem jî kirîbên hev in. Kalikê min ji camêrê ber yazixanê re dibêje em xwesî û xenzûrê Emer in, Emer bavê min e, li Swêregê Otoşark destê wî de ye, camêr zêde rû nade wan, bîskî şûnda bavê min û xwunga min tên wir. Camêrê ku rû nade Apê Sefo radibe ser xwe, ber bi bavê min baz dide, serxweşiyê li bavê min dike, qîmet û rûmeta xwe ji bavê min re nîşan dide. Apê Sefo nikare xwe bigre, radibe ser xwe, destê xwe ji para davê şalwarê camêr û dibêje, "Şeqên dirêj şalwerê fire, illa pere illa pere!"
Henekçîtiya Apê Sefo derbasî zarokan jî dibe, bi taybetî qîzên Apê Sefo di jiyana sosyal de gelek azad û henekçî ne.
Apê Sefo dema bi rê de diçû hertim li fitika dixist. Dinê ne xema wî bû. Xwarina wî, mekteba zarokên wî, henek û kêfên rojane jiyana wî bûn. Divê her roj goşt bixwara, xwarina bê goşt

ne xwarin bû. Bes wî tu caran kîlo li xwe zêde nekir, zirav û çeleng bû, şewqeyê xwe xwar dikir, destên xwe dida paş pişta xwe li fitika xwe lê dixist û dimeşiya.
Ji xoceyên camiyan re tu cara hurmeta wî tunebû. Ji me re digot, lawê min evana ne rast in, li camiyê tiştekî dibêjin li mala xwe û di jiyana xwe ya rojane de tiştekî dinê dikin. Dema nas û cîranên me, merivên welatê me birçî û tazî bin ji me re tiştek ferz
13
nîn e, ne rocî, ne hec û ne jî nimê û camî. Divê em beriya her tiştî birçî û taziyên xwe têr bikin, ji wan ra alîkar bin. Heta ku em vê wezîfa xwe neynin cîh her gotina ku em dibêjin vala ye.
Apê Sefo di jiyana xwe de, tu carî lingê xwe navêt hundirê camiyê, tu carî rocî negirt û tu carî nimêj nekir. Ji ber wê yekê xoceyên mehela me ji bo Apê Sefo digot, "Ew kafir e!"
Dema ez zaro bûm dikana Apê Sefo li ber devê xana Hec Usib bû. Li wir caw difrot. Bêyî dikanê li ser riya Gebendirîsê erdê wî hebû. Apê Sefo hemû mal û milkê xwe dabû ber lingên zarokên xwe, digot bira zarokên min mektebê bixwînin bira ez jî li ser cila reş rûnim, ez ê hemû erdê xwe bifroşim û wan bidim xwendinê. Û wisa jî kir, erdên xwe bi perekî pir kêm firot û zarokên xwe da xwendin.
Di mehela me da, xortên ku li derveyî Swêregê mekteb dixwend ji pênc tiliyan zêtir nebûn. Gava wext û saet temam bû zarokên Apê Sefo yek û yek çûn derveyî Swêregê û dest bi xwendina xwe kirin.
Xalo Mehemed ji Hesen û Ferîd mezintir bû. Herî pêşin wî dest pê kir. Herî mezinê wan xalê min Abdo bû, bes xalo Abdo tu cara mekteb nexwend, kar û barê wî terzîtî bû. Li Swêregê dû

babet terzî hebûn: Yên ku cilên gundiyan didrût û yên ku cilên modem didrût. Xalo Evdo ji babetê yekemîn bû, şalwar, ebe û fîstanê gundiyan didirût. Gava ez vê nivîsarê dinivîsînim ew jî li bajarê Wêranşarê fîstanên bi neynik, pûl û morîkan dineqişîne. Xalo Mehemed ket mekteba Herbiyê, gava ew havînan dihat mal ji bo me zarokan dibû şênayî. Bi meraq û heyecana dilê xwe, me baz dida mala Apê Sefo. Xalo Mehemed dibe paca me ya herî pêşîn, paceya li hember dinyaya derveyî Swêregê.

14

Pacayek wisa ku em dikarin tê de bajarên mezin, trênên ku li ser şivên hesinî diçin, erd, ezman û behrên bê serî û bê binî bibînin. Xalo Mehemed bi xwe re ba û bîhnên diyarên ku me ne bi xewnên şevan û ne jî di jiyana xwe ya rojane de didît, ji me re dianîn. Kêfa dilê me bê sinor û bê hesab bû, ger ez bibêjim ji kêfan per bi me ve hêşîn dihatin wê nebe mubalexe. Ji me zarokan hez dikir, bi me re henek dikir, gulaş dikir, em radikirin ser piyên xwe û hiloyî jor dikir.

Kêfa Apê Sefo pir ji wî ra dihat, bes ev kêfa wî dûr û dirêj najot. Di nav herbiyê de inqîlab çêbû, Xalo Mehemed ji Herbiyê avêtin, heqê xwendinê ji dest girtin. Demekî şûn da heqê wanê xwendinê paşda hat dayin; Wî ji nû ve dest bi mektebeke din kir. Mekteba Bilind a Tenduristiyê (Saglik Yuksek Okulu) xelas kir û li Çorimê dest bi kar kir. Piştî demekê tayîna wî hat Diyarbekîrê. Li nexweşxana Nimûneya Diyarbekîrê bû serekê kar û barê îdarî. Sê heb zarokên wî çêbûn, hîna zarokên wî çûk bûn nexweş ket. Cinawirê qanserê wek tofana çiyayê sîpanê xalê min Mehemed ji nav me digre û dixe bin heriya sor a Swêregê. Qehra apê Sefo û dakê Kejo wek bîra kûr û bê binî ye, xalê

min Hesen li Anqerê dibe elektrîkçiyê trênê, xanima wî ji Çorumê ye. Bi hev re dizewicin û li Anqerê bi cîh dibin, ji wan re du zarok çêdibin. Ji welatê xwe, ji dê û bavê xwe dûr dikeve. Apo û dakê hemû eşqa dilê xwe, wek konê koçeran li ser Ferîd vedikin. Ferîd di nava zahmet û zoriyê de mekteba xwe xelas dike û dibe mihendisê ziraetê. Qehra Mehemed a di dilê dakê û apo de winda nabe, bes piçekî sivik dibe. Ferîdê wan, şekirê dilê wan, kulîlka bira û xwungan, ba û bîhna biharê li wan vedigerîne, xwe li wan dipêçîne, bi bîhna xwe wan serxoş û serbilind dike.

15

Li Anqerê

Dema xalê min Mehemed li Anqerê dest bi Mekteba Bilind a Tenduristiyê dike, Hesen û Ferîd li Anqerê ne. Xalo Ferîd li Ziraet Lîsesî sinifa dawî dixwîne. Xalo Heso jî li Elezîzê Meslek Lîsesî xelas kiriye û hatiye Anqerê ku unîversîtê bixwîne. Heso û Ferîd di xaniyekî xwendevanan da dimînin. Beriya ku Memehed were Anqerê bi qîza apê Ahmedê îbo, Sakîneyê re dizewice û tev tên Anqerê. Xalo Mehemed û Abla Sakîne li Bîtpazariyê, li Mehela îtfaiyê xaniyekî axşab kirê dikin û Heso û Ferîd digrin ba xwe. Xaniyê wan du qat e, li qatê ewilî banyo, tuwalet û du ode, li qatê jor jî mitbax û odeyek heye. Demek şûnda, lawê xalê Miçoyê Ebasê Zilkif, ji xalo Ferîd wan re nameyeke dûr û dirêj dinivîsîne. Dixwaze xalo Ferîd di xaniyê xwe de cîh bide wî. Abla Sakîne dibêje "Bila ew jî bê, em ê hevdu îdare bikin." Herwiha Zilkîfjî tê û di xanî de bi cî dibe. Abla Sakîne dibe dayika wan, kincên wan, şîva wan, feraqên wan, paqijiya malê, bi kurtasî kar û barên malê lê ser milê Sakîneyê ye. Kêfa xalo Heso ji xwendinê re nayê, dixwaze

karekî bike bes cangiraniyê dike, li kar nagere, xalo Mehemed bi
16
zor û bela wî dibe "Devlet Demir Yollari" û li wir wî wek elektrîkçî dixe kar. Xalê min Hesen ji wî karî emeklî dibe û li Anqerê dimîne.
Xalo Ferîd 1967an de lîseyê xelas dike û dikeve Unîversîta Teknîkê ya Rojhilata Navîn (ODTU) û ji wir derbasî Fakulta Ziraetê dibe, ciyê fakultê li Dişkapiyê ye, sal 1968an e.
Di nava keçikên xwendevanan da Ruhsar jî heye, Ruhsar û /Ferîd dikevin yek grûbî.
Di warê siyasî de bihareke rengîn daketiye ser dinê. Şerê azadî û serbilindiyê, biratî û azadiyê ji Vîetnamê, Afrîqayê, Ewrûpa û Asyayê ba û bîna biharê belayî erd û ezmanan dike. Efendî, beg û axayên zilm û zorê wek pelên spîndarê li ber vî bayê xweşik dilerizin. Di bin esmanê biharê de bilûrên şivanan musîka eşqa dilê xortan dilorîne, eşqên herî pak û zelal, eşqên herî xweşik û giran di vê biharê de çêdibin, bihar wek laleyên zer û sor dilê însanan dixemilînin. Ji Başûrê Kurdistanê pêşmerge, wek Ferîd di helbesta xwe de dibêjê, derketiye serê çiya, bayê azadî û serfiraziyê li nav welat belav dike. Xwendevanên kurd ên li metropolan bi guhekî guhdariya dinê dikin û bi guhê din jî guhdariya pêşmergeyan dikin.
Ferîd aşiq dibe. Li mektebê sala wî ya pêşîn e.
Tayîna xalo Mehemed derdikeve Çorumê, ew bar dikin diçin, bes Ferîd, Zilkîf û xalo Hesen cama cilên xwe yên qirêj dibin ba abla Sakîneyê. Abla Sakîne cilan dişo, utî dike û ji wan re dişîne. Ferîd rojekê ji abla Sakîne re dibêje, "Ez aşiq bûme, ka were keçika min bibîne." Abla Sakîne bi Ferîd re diçe Fakulteya Ziraetê,

keçika ku Ferîd aşiqî wê bûye Ruhsar e, li baxçê mektebê mniştiye. Ferîd wê bi tiliya xwe nîşanî abla Sakîne dide. Abla Sakîne li
17
Ruhsarê dinêre, keçik xasek e, dikeve serê Sakîneyê. Ji Ferîd re dibêje, "Keçika te xasek e." Diçin ba Ruhsarê û halê hev dipirsin. Gava Ferîd li Anqerê Zîraetê dixwîne DDKO ava bûye. Hin xortên xwendevan û pêşverû di nav DDKOyê de ciyê xwe digrin, ji aliyekî mekteba xwe dixwînin û ji aliyekî din kar û barên xwe yên komeleyê dom dikin. Ferîd di nav kar û barê wê komelê de ciyê xwe digre, tembûrê lê dixe, govendê digre û di karê rojane de pêwîstiyên xwe tîne cîh. Komela wan kulturî ye, bes kar û barên dikeve ser milê wan, hem giran û hem jî siyasî ye. Analîz, teorî û perspektîfen li wir çêdibin hem li ser nivşê wan hem jî li ser nivşên li dû wan tesîrekî mezin çêdike. Çepên Tirkiyê wek niha wê gavê jî tifinga xwe ya zengarî û gemarî derdixin û gulleyan dibarînin ser wan de. Yên gotina kurd dibêjin, "Milliyetçî ne û wê Tirkiyê ji hev bixînin."
Tirkiye li hev ketiye, xwendevan li her derên Tirkiyê rabûne ser xwe, eşqa şoreşê, qehremanî, serbilindî û serfirazî rê li wan şaş kiriye, yê ku demançeyekê û tifingekê dixe destê xwe, dest bi şoreşê dike. Hinek xortên kurd di nav wê şoreşa xwendevanên tirkan de cî digrin û wenda dibin.
DDKO di nav şoreşek dinê de ye: Kurd hene an tunene? Şoreşa DDKO ev e. Divê li gel xelkên Tirkiyê bidin qebûlkirin ku kurd hene.
Ji bo Ferîd demeke nû, demeke xweşik û demeke bi zehmet û zor dest pê kiriye. Hêviyên wî, hesreta wî ya rojên pêşin ji her tiştî pêşdetir û bilindtir e. Eşqa wî û Ruhsarê jî di bin wê dara

hesretê de hêşîn û mezin dibe.
Ji bo edalet, heq û huqûq xebat kirin ne hêsa ye. Hele li welatekî wek Tirkiyê qet ne hêsa ye, herî bêtir ji bo mafen kurdan
18
xebat kirin e. Wek tu xwe bavêjî nav agirê cahnimê, ne tenê dagirker, hêzên ku hay û bayê te jê tune, dibin dijminê te, dibin celadê mh û canê te. Divê hem mhê te û hem jî canê te bigrin. Hevalên te yên bav û kalan, nasê te, hemwelatiyên te jî dikarin bibin dijminê te. Tarîxa me şahîda wê ye. Bê hejmar kurd hatine kuştin, xaîntî û xiyanetek bê sinor li erd û ezmanên me heta niha hukmê xwe ajotiye. Gotina min ew e ku di rûpelên pêşî de em dibînin ku yên derbên xwe yên zalim li ser Ferîd dibarînin, cardin zarokên vî welatê me ne. Yên demançe dane destê wan, yên nan û av dane wan, yên ew veşartine jî bê guman kurd in.
Yek caran ez xeyalan dikim, ez hêvî dikim ku kurd wê rojekê ji bo xwe, ji bo zarokên xwe jiyaneke însanî ava bikin, jiyaneke bê mêrkujî, bê hesûdî, bê durûtî û dûvikî. Hevdu kuştin dê qedexe bibe, kurdek dê kurdekî nekuje. Kes li kesî tade û zulmê neke, neheqî û bêbextî, mêrkujî, dizî, divê bibe şerm û rûreşî.
Bira zarokên me, ne di bin dara mirinê de, bin dara jiyanê de bilîzin û mezin bin. Bira bilûrên şivanên me ne kilamên mêrkujan, kilamên eşq û dilovaniyê bilorînin. Evana xeyalên min in û ez wisa bawer im ku xeyalên Ferîd jî wisa bûn. Di kilam û helbestên Ferîd de, ne axa û beg û ne jî mêrkuj û eşîr hebûn, kilamên wî kilamên gundî û cotkarên me bûn, kilamên xelkê reben bûn, lorîkên dayikan bûn.
Kilamên wî, hesreta dilê wî, bûn mirina wî.
Hêzên ku ji van kilaman hez nedikirin, rabûn gulle li xwediyê

kilaman barandin.
Min bi saya serê hevalê delal Sîno Xurşîd du helbestên Ferîd peyda kirin. Ez wan her du helbestan li jêr dinivîsim.
19
Pêşmerge
Tenê bû, rabû ser piya
Hêla rastê çiya, çepê çiya
Rakir ala rengîn qîrya
Deng veda, deng veda, deng veda
Deşt û zozan û çiya naliya, naliya
Gîhîşt geiiya
Gundî, karkêr, pale û zana
Rabûn giryan, rûniştin giryan
Ban kirin keç û bav û diyan
Civiyan ser hev, dest dan destên hev
Pişt dan pişta hev
Qîrîn û hawar dan hev
Hemî bûn yek dev
Qor bi qor, rêz bi rêz
Çûûûûûn çûn li dor pêşmerge yek bûn.
Bijîn, bijîn, her bijîn hûn
Deh, sed, hezar, sedhezar
20
Zar û zêç, keç, qutabî, dersdar
Li hember gihîştin faşîstên har
Tev bûne wek dîwar
Metirsin, metirsin êdî şer nabe sar
Ji Xaneqîn heta Şeqlawa

Herêm, herêm, cî bi cî
Welatê kurda
Ketiye bin destê pêşmerge, neviyên Kawa
Dehaqê rûreş, bapîrê Baasiya
Wê rojê lêdan bavê pêşmerge Kawa
Berê Newroz tenê bû cejna kurda
Lê îropêşmerge hergav, herdem
Ava dike cejna
Pîroz be, pîroz be, li te Kurdistan
Ey pêşmerge.
Çi bêjim hindik eji te ra
Deşt, zozan, çiya hemû
Ji te ra bûye derge
Bijîn, her bijîn hûnpêşmerge.
21
Kevokên Spî
Kevokên spî, kevokên spî
dê bênfîrandin
Xerîtên kevin, xerîtên kevin
dê bên çirandin
Cahş û mahş, cahş û mahş dê bên bakirin
Kurdistan, Kurdistan dê bê
Belê belê nihaji bo meye
diyameheye
Bav, , çelûpel
Deşt û zozan, çiyayê Kurdistanê ê me ye
Me qîrîn û hawar daniye dîlan
Bûka me, bûka me Kurdistan

Deng bidin hev, gazî kin hevalan
Bira rakin topan, bira rakin çekan
Bira hespên xwe rakin ser piyan
Kêm mekevin, kêm mekevin
Ha xortên dilovan
22
Dem bi dem gav bi gav
Werin, werin, werin ha werin
Dewran, dewranji bo ê şerên
Ê ku têkoşîna doza xwe nekin ker in
Herin, herin heta Bexdqyê herin
Bînin, bînin serê Hesen el-Bekir bînin
Segbav Husên, segbav Husên
Bîr mekin, ha bîr mekin!
Warên wan, warên wan
Bi ser wanda hilweşînin
Erd û ezman, erd û ezman
Bi ser wan da bireşînin
Heyfa Leyla; çira Kurdistanê
Bistînin ha bistînin.
23
Evîna Ferîd û Ruhsarê
Ferîd û Ruhsar di salekê de dikevin Fakulta Ziraetê, dewra wan dewra 1968an e. Ferîd û Ruhsar dikevin yek gmbê. Ji rojan rojekê divê hemû xwendevan wêneyên xwe bikşînin, Ferîd di nava gmba xwe de ji Ruhsarê dipirse ka ew dikarin rismê xwe tev bikşînin. Ruhsar dibêje baş e. Wê rojê wêneyên xwe dikşînin. Tu nabê Ferîd bê xebera Ruhsarê bûye aşiq. Ew radibe

wêneyekê digre, dixe nav zerfekê û nameyekê jî dişînê Swêregê ji Apê Sefo re. Gava nama Ferîd dikeve destê Apê Sefo êdî qiyamet radibe, qiyametek wisa ku erd û ezman li hev dikeve. Aşiqê dîn û sûtal, ewladê bê xêr, Ferîdê ne eşîr, Ferîdê eyarsîr radibe dibe aşiqê keçikek xerîb, keçikek ku esl û feslê wê ne belî ye, mirov vê yekê li bavê xwe dike, mirov vê rûreşiyê tîne serê Apê Seferê Qado? Dost û nas ê çi bibêjin? Em ê çi xweliyê li serê xwe kin?

Ferîd, Ferîdê evîndar, asiqê dîn û perwane li ser ezmanan difire, qarîn û qîrîna Apê Sefo ji guhekî dikeve hundir ji guhê din derdikeve der.

24

Dewran diguhere, dewranek nuh, dewranek xweşik û bê sînor wek gulên sor siya xwe avitiye ser nivşên nuh, eşîr û eşîrtiyê berê xwe daye ber bi rojavayê ve diçe.

Apê Sefoyê ku aqildar û pêşverû ye wê guhertinê ferq nake, nabîne ku dara dewranê her tim ciyê siya xwe diguherîne. Ji ber vê yekê erd û ezmanan li hev dixe. Şewketê Apê Mizûr, pismamê Apê Sefo, diçe mala Apê Sefo û wî sakîn dike. Dibê,

"Sefo qiyametê rameke! Binêre, tu jî aşiqê Xodê bûbûy, keçika koçeran Xodê, aqil û heşê te ji serê te biribû, dê û bavê te, mirovên te hember derket. Tu û Xodê negîhîştin mirazê xwe. Niha tu çima pêşiya vî lawikî digrî?" Şewket, Apê Sefo dixe nav kuça teng, çare li Apê Sefo namîne. Bê çare û bê dil ji kera xwe dadikeve jêr.

Min berê gotibû, Ferîd Ruhsarê nîşanî Sakînê jî dide, Sakîne dibêje gelek baş e. Herwiha di merhala dawiyê de malbata Ferîd dibêje erê, bes feqîra Ruhsar hay û bayê wê ji tiştekî tune. Ferîd

car bi car diçe mala diya Ruhsarê, Ruhsar li mala diya xwe dimîne, bes Ruhsar Ferîd wek hevalekî xwe dibîne, hevalekî mektebê, ne kêm ne zêde.
Gava Apê Sefo jî dibê erê, edî Ferîd ji kêfan wek çûçikekî azad difire. Xwe dilezîne ba Ruhsarê, dibêje ez dixwazim bi te re bizewicim. Ruhsar mat dimîne, heş û aqil ji serê wê diçe, nizane çi bibêje. Heta wê deqîqê wê bi çavê hevaltiyê li Ferîd nihêrtiye, heta wê gavê qet zewac nayê bîra wê. Her duyan nû dest bi mektebê kirine, li pêş wan riyeke dûr û dirêj heye, ziman li dêv kilît dibe, dibêje "Ferîd, divê ez bi diya xwe re bipeyivim."
Bavê Ruhsarê tune, gava Ruhsar zaro ye ew di qezayekê de wefat dike. Bavê wê mutehît e, di mintiqa Xarpêtê de bi qamyona
25
xwe li ciyê înşaatê kar dike. Gava tekerê qamyonê dikeve çalekê, bavê wê ji qamyonê dikeve û wefat dike. Ruhsar wê demê li der dora sê sal û nîva ye.
1978an de, li Swêregê wê delaliyê xwe winda bike. Qîza wî Yekbûn sê sal û nîv e. Ew jî li Kurdistanê bavê xwe winda dike. Latîfe xanim Ferîd baş nas dike, Ferîd diçe mala wan û tê. Ruhsar dibêje dayê, "Ferîd ji min ra wisa dibêje ez çawa bikim?" Diya wê peyva xwe dirêj nake, dibêje "Qîza min Ferîd lawikekî baş û delal e, ew kurd e, bes yê giring ew însanekî baş e. Ji bo min problemek tune."
Ferîd û Ruhsar dergîstî dibin. Hevalê Ruhsarê Ferîd, carekê de dibe dergîstiya wê, eşqa dilê Ferîd li dilê Ruhsarê stêrkên ezmanan vêdixîne, Ruhsar jî ne bi dilekî bi deh dilan aşiqî Ferîd dibe. Li ser giyayên êşîn û xweşik, di nav kulîlkên sor û zer de govendek li dar dikeve, Ferîd û Ruhsar di serê govendê de ciyê

xwe digrin, şev û rojên wan dibe govendeke xweş û rengîn, govenda eşqa dilan, dilên serxoş, pak û delal, govendek bê serî û bê binî, dawiya wê nayê.
Lê rojên pêş yên ji şahî û şadiyê hez nakin, ew ê wan ji hev biqetînin, bes govenda dilê wan tu caran nasekine. Heta roja ku zewaca xwe bikin gelek sal derbas dibin û gelek mecmele tên serê wan, bes govenda wan dom dike.
27
Hefs û dawet
Ji êvaran êvarek, ji mehan meha adarê ye, serma û seqema zivistanê dom dike, tariya êvarê, dux û dûmana seyaran, qalorîferan, sobeyan û fabrîqan wek çarşefa reş daketiye ser Anqerê. Ruhsar, Ferîd û diya Ruhsar Latife xanim li dora masê şîva êvarê dixwin. Çavên wan li xwarinê, guhên wan li radyoyê ye. Di 12 Adarê de leşkera ixtidar girtine destê xwe, rojên pêş wê çi bibe kes nizane. Spikerê radyoyê navan dijmêre, yên navên wan tên hejmartin divê biçin xwe teslîmî polîs bikin. Navê Ferîd jî di nav wan de ye. Pariyê wan di qirika wan de dimîne.
Ferîd dikeve hefsê, Deniz Gezmiş û hevalên wan tên îdamkirin, welatperwerên çep û rast li Diyarbekîrê tên berev kirin. Li ser rêya Seyrantepê bereqa eskeran dibe girtîgeha kurdperwerên rast û çep. Yên "bi sûc" û yên "bê sûc" li wir tên berhevkirin. Di nav wan de Ferîd jî heye. Car bi car ez bi diya xwe re diçim ziyareta Ferîd. Kêfa wî li cî xuya dike, gava ew û diya min qise dikin ez jî li girtiyên dina temaşe dikim, li ber qawişê hewşa wan heye, ji xwe re piyase dikin. Di navbera ziyaretvan û girtiyan de tenê têlên bi dirik hene, bi hêsatî em
28

dikarin wan bibînin. Her caran ku em ji Ferîd vediqetin, êdî ez wî ji bîr dikim û bi xeyalên xwe mijûl dibim. Xeyalên min, eşqa min, heye tune fiitbol e. Bi fiitbolê ve dijim, bi fiitbolê ve radizim û bi fiitbolê ve radibim. Bes ferqa girtiyên Diyarbekîrê û girtiyên hefsên normal li mijiyê xwe qeyd dikim. Ji ber ku zarotiya min pir caran li rêya hefsa Swêregê derbas dibe. Bavê min ji qebedayên Swêregê yek e, lingekî wî li derve ye û lingekî wî jî li hefsê ye, gava kesek tunebe ku pêre lec bike, dikeve yaxa polîsekî an sîleyekê li wî dixe yan jî qumçên unîforma wî jê dike û dikeve hefsê. Ez û birayê min jî her êvar jê re xwarin dibin hefsê. Em girtiyên wir nas dikin û dibînin, halê wan, rabûn û mnistina wan û girtiyên Diyarbekîrê pir cihê ye an jî ji min ra wisa tê. Yên Diyarbekîrê serbilindî nîşan didin, meşa wan, peyvên wan babetek dinê ye, wek li ser çiyayekî bilind rûnistine û temaseyî dinê dikin, li hember qerdiyana destên xwe li hev girênadin, ji qerdiyanan re efendî nabêjin. Hember qerdiyanan serbilind disekinin. Ji wan rojan ev risim di mijûyê min de ciyê xwe digre.

Ranza Ferîd û îhsan Yavuzturk li kêleka hev in, hevaltiya wan pir baş e, nêzîkî hev in. Ji rojan rojekê pismamê min Mehemed jî tînin hefsê. Ferîd li Mehemed xwedî derdikeve, jê re cî çê dike. îhsan ranza xwe dide Mehemed, êdî Ferîd û Mehemed li kêleka hev radizên. Mehemed dibe xwendevan, Ferîd dibe mamoste. Ferîd di warê ziman de gor heval û dostên xwe yên hefsê pir pêşde ye, dikare kurdî bixwîne, binivîsîne. Siiran, kurteçîrokan dinivîsîne, kilaman dibêje, kilaman dinivîsîne.

Di nava girtiyan de yê herî ciwan Mehemed e, 1 7 salî ye û yên herî pîr Xelîl Axayê şimexî ye, salê wî jî 75 e. Xalê Xelîl Çîçek kurdperwerekî baş e, ji Mele Mistefa Barzanî re şekir, ard,

rûn şandiye, ji ber wî yekê ew jî avêtine hefsê. piraniya hevalên Ferîd ê hefsê, ji yê herî ciwan heta yê herî pîr, bê yek-du kesan hemû ji Ferîd hez dikin, qedir û qîmeta wî dizanin. Ferîd bi hunerê xwe, bi enerjî û dilsoziya xwe, bi kurdperwerya xwe di dilên dost û hevalên xwe de ciyekî taybetî digre. Bi ziman û saza xwe, bi kilam û kurteçîrokên xwe, bi şexsiyeta xwe ya kurd û modem di nava nivşên kevn û nû de piran ava dike, bi rabûn û rûnişkandina xwe, bi jiyana xwe ya rojane ji bo rojên pêş dibe ronahiya şevên tarî.
Ger ez bibêjim di her tiliyê Ferîd de hunerek hebû, ne mubalaxe ye. Ferîd mekteb xwendin hez dikir, bi gotinek dinê, ji hînbûnê hez dikir, tiştên ku ji vî meraqa wî xelas dibûn pêr kim bûn. Di warê matamatîkê de jîr bû, gava problemek zor derdiket pêş wî, heta ku wî ew problema hel nekira dev jê ber nedida. Gava min nikarîba dersên xwe yên matamatîkê çêbikirana, ez diçûm ba wî, bi sebir alîkariya min dikir û dixwest ku ez fam bikim ku ew problema çawa çareser dibe.
Futbolciyekî baş e, li Anqerê dibe qelebanê Demir Sporê. Havinekê li Swêregê dibe qelebanê Swêreg Sporê, wek qelebanê mêvan di taximê de cî digre. Di wê maçê de ez û çend heval li kêleka qeleyê rûdinin û temaşeyî wî dikin. Wek pisîkê sivik û çapik e, li hewayê difire, ji refleksên wî re heyran dimînim. Ez bawer dikim di nav merivên me da yê herî pêşî futbolê dilîze, birayê Ferîd, xalê minê Hesen e, dû ra Ferîd dest bi fiitbolê dike. Gava Ferîd li Demir Sporê dilîze, ez û pismamê min Mehemed jî li Swêregê ftitbolê dilîzin. Navê taxima Mehemed "Qertel Spor", navê taxima me jî "Şahîn Spor" e. Rengê wan sor û reş e, yê me

jî kesk sor û zer e, uniformayên me rengareng in, bi cilên pîrekên 30
Qerecdaxê dimînin, her babet reng tê de heye. Gava em bi wan ra maçê dikin ew zora me dibin, em jî dest bi teşqelê dikin.
Di hewşa hefsa Diyarbekîrê de, Ferîd, Mehemed, Mehmûd Kiper, Mehmet Tuysuz ji bo kêfê car bi car topê lox dikin. Menecerê wan abûqat Bahattin Eryilmaz e, wî jî kovarek bi navê Sêrsuvar derxistiye, di warê kurdperweriyê de weşan kiriye, ji ber vê yekê ew jî avêtine hundir. Her cara ku Ferîd û hevalên wî hunera xwe ya fijtbolê nîşan didin, Bahattin jî, wan bi qedayif û baqleve gur dike. Dibêje, ger hûn baş bilîzin, ji qantînê dilê we çi bixwaze ez ê bidim hanîn.
Di warê musikê de, bi taybetî Ferîd bi Nûrî ve tev pir dixebite. Piştî hefsîbûyîna 71an ew û Nûrî bi musika kurdî kasetan çêdikin. Nûrî hevalekî hêja û delal e, ji Wêranşarê ye. Gava Ferîd di nava Kawayê de cî digre, Nûrî jî wek min di nav refên DDKDê de kar dike. Beriya çêbûna grûban Nûrî û Ferîd pir nêzîkî hev in, tiştê wan tîne ba hev dengbêjî, meraqa edebiyatê û zimanê kurdî ye, bi taybet şîîrên Cîgerxwîn, kilamên Mehemed Şêxo ne. Nûrî gava kilamên kurdî dibêje por li ser serê min pîjpîjî dibe. Dema Ferîd û Nûrî tên ba hev êdî her du per bi xwe ve dikin û bi ezmanan dikevin, dinyaya li dora xwe ji bîr ve dikin, li dora wan kî çi dibêje, bo çi dibêje nagîhîje guhên wan. Ferîd li sazê dixe û Nûrî dest dibe ber guhê xwe. Yekcaran hinek kilaman tevde dibêjin, wê gavê jiyana hesûdî, xeybet, nifaq, birakujî, mêrkujî, derew û dolabên rojane ji bo çend deqiqeyan be jî li ber çavên min winda dibin. Bîhn û bayê biharê dadikeve ser min, baraneke xweş û nerm dest pê dike, ava baranê bîhn û

buxa erq û lexeman dixe ber xwe û dibe ciyekî dûr. Ew çend deqîqeyên bi sihêr, dibe bihareke dûr û dirêj. Yên li wan kilaman
31
guhdarî dikin wek di nav wê deqîqeyê de bibin însanekî din, mh dikeve çavên wan, bîhna wan fire, mhê wan aza dibe.
Ferîd ji ber vê yekê di tarîxa me da ciyekî taybet digre. Bi kar û barê xwe yên şoreşgerî, mejiyê me, bi saza xwe jî dixwaze mhê me aza dike. Dixwaze mhê ku bi hezar salan e tê perçiqandin, pelixandin, mhê ku roj bi roj dirizin, mhê ku bi hesûdî, bi dijminatî, bi nezantî bûne wek qetrana reş aza bike, wî mhî ji bin nîrê gayî xelas bike.
Ruhê me li zencîran ketiye, mejiyê me, dest û lingên me li zencîran xistine, sibê heta evarê tiştê em li ser difikirin, tiştê em li ser galgalan dikin hîle ye, firildaq e, hevxapandin e, bîr û mezelê hev kolan e. Kî mezelê kî herî baş bikole ji wî re dibêjin, ew peyakî xurt û egîd e, camêrekî şerkir e. Wisa tê fikirandin wisa tê gotin. Jiyana ku li serê me hatiye gerandin ev e. Û ev jiyan hem bi zencîrên xuya dike û hem jî bi zencîrên ku xuya nake, wek fîstanekî dînan li me kirine.
Ferîd di merhaleyeke wisa de diçe ber vê zencîrê, bi saz û kilamên xwe, bi zimanê xwe yê bav û kalan, bi serwextiya xwe dibêje, "Ev e! Ev xeleka ku ez bi tiliya xwe nîşan dikim, xeleka herî zeîf û sist e, destê xwe bavên vê xelekê, ew zencîra ku bi hesinê pola çêbûye, ew zencîra ku bi hezar salan mhê we, dest û lingên we girêdaye wê ji hev de bikeve, wê perçe perçe be, wê hûrhûrî bibe, wê bibe toz û dûman û bikeve ber bayê biharê..."
Xeleka ku Ferîd nîşan dide ziman e. Ferîd zimanê me yê ku bi hezar salan e xistine heft qat binê erdê, ew bi pênûsa xwe, bi

kilamê xwe, bi şîîr û kurteçîrokên xwe santîm bi santîm ji binê erdê derdixe, gend û gemara hezar salan bi devê xwe puf dike û pak dike. Mezinbûna Ferîd ev e.

32

Ez hêvî dikim ku ev gotinên min çcwt neyên famkirin. Ez dirokê înkar nakim û dirokê bi Ferîd ve jî dest pê nakim. Erdê ku Ferîd li ser disekine, erdekî vik û vala nîn e, li ser vî erdî beriya ku Ferîd ji diya xwe bibe, kurdî tê peyivandin, kurdî tê nivîsandin, bi kurdî kilam û şîîr tên gotin. Gava Ferîd helbesta dinivîsîne, di bin serê wî de dîwanên Cîgerxwîn hene. Bes di nav nivşê me de, nivşê me yê ku dixwaze milletê kurd wek hemû milletan bibe xwediyê jiyaneke însanî û serfiraz, Ferîd ciyekî taybet û giran digre.

Millet kurdî dipeyive lê belê em li ser siyasetê bi tirkî dipeyivin; semîner, mitîng, civîn û munaqeşeyên me bi zimanê tirkî ne, heta em di nav xwe de jî tirkî dipeyivin. Literatura çepê kurd tirkî ye. 27 sal piştî Ferîd, ev literatur hîna jî bi zimanê tirkî ye, gelek însanên ku ji sibê heta êvarî xelkê azad dikin, hîna kurdî nizanin, dibe ku di jiyana xwe de carekê jî bi sê gundiyan re rûneniştine û neketîne nav sohbetekê.

Endamên DDKOyê gava derdikevin ber mahkemeyê, korregirêka herî girîng tunebûna kurda ye. îdeolojiya resmî bi devê dozgerê mahkemê vê dibêje "Kurd tunene! Yên ku ji xwe ra dibêjin kurd di eslê xwe da tirk in."

Endamên DDKOyê hebûna kurdan, bi hebûna xwe, bi zimanê xwe yê dê û bavan, bi tarîxa xwe, vê iddîayê pûç dikin. Di warê delîlan de tiştê ku bi giranî dajon pêş mehkemeyê zimanê kurdî bi xwe ye.

Endamên DDKOyê xwe diparêzin an jî divê em wisa bibêjin,

endamê DDKOyê li hember iddîanameya dozger hebûna kurdan, hebûna zimanê kurdî diparêzin. Di dîroka modem a llrkiyê de xwendevanên kurd, pêşverû û ronakbîrên kurd bi serwextî, bi cesaret û serfirazî li dijî îdeolojiya resmî radibin ser piyan.
33
Bi cesareteke medenî û bi rêyeke ilmî iddianameya dozger dikin binê erdê, tiştên ku di iddianamê de cî girtine, yekayekji hevdu dixin. Ideolojiya resmî, di huzûra xelkê kurd û tirk da deşîfre dikin. Bes mahkeme di îdeolojiya resmî de israr dike. Endamên DDKOyê ceza digrin. Cezaya herî bilind 16 sal e, Ferîd xwe baş diparêze, 14 sal ceza didin wî jî.
Sala ku Ferîd ji hefsê tê berdan partiya Ecevît li ser hukim e. Ecevît 1974an da Qibrîsê, wek zebeşê Diyarbekîrê ji navê de diqelişîne, Qibrîs dibe du perçe; perça yunaniya û perça tirka. Cûntaya yunanî ji iqtîdarê dikeve, demokrasî tê Yunanîstanê, li Tirkiyeyê Ecevît dibe qehreman, qehremanê demoqrasiyê. Piştî dagîrkirina Qibrîsê Ecevît efûyekê derdixe, girtiyên siyasî jî dikevin ber efijyê, Ferîd û hevalên wî yên kurdperwer ji hefsa eskerî ya li Diyarbekîrê tên berdan.
Ferîd bi def û niqaran digihîje Swêregê. Ruhsar li gel Ferîd e, piştî sê sal û nîvan, hesreta roj û şevan xelas dibe, apê Sefo dibêje fersend ev fersend e, em ê dawetekê bikin du dawet, bira reqîna def û zumê gur bibe.
Ferîd û Ruhsarê wek suwariyên hespên gewr û boz bi zeman re ketine xarê, divê hespa zemên bi qefilînin, dive serî jê bistînin, divê ne li paş, li pêş zemên bijîn, deqîqeyên, saetên, roj û salên ku winda bûne divê vegerin, divê Ferîd û Ruhsar wê zemanê wek ava kûzê hûnik bi ser xwe da bikin û vexwin.

Wek apê Sefo dikin, dawetek dibe du dawet, telgrafekê ji Latîfe xanimê re dişînin, Latîfe xanim û birayê Ruhsarê Erhan zû bi zû didin rê.
Dawetek xweş û giran li mala Sefoyê apê Qado li dar dikeve. Mehmûdê Kaloyê Aresî bi cil û cawên folklorî serê govendê
34
dikşîne, Ferîd li kêleka hewzê rûniştiye, pismamê min Alo wî traş dike. Kêfa apê Sefo li cî ye, destên wî li paş wî, li nava dawetê qolaçan dike, bi henek û qisên xwe kêfa mêvanan xweş dike. şayiyeke wisa daketiye ku kes kesî nabîne, zarokek ji ser xanî dikeve hewşa kalikê min ê Husên, bes tiştek nabe. Meriva min Zozanê, wê gavê zaro ye, niha xatûna pismamê min Mehemed e, dikeve nav bîrê. Bes ew jî difilite, tiştek nabe. Herwiha piştî demeke dûr û dirêj, Ferîd û Ruhsarê bi kêf û şayî digihîjin mirazê xwe û dibin jin û mêr.
Li gor diya min di nav vê kêf û şayiyê de jan li xalo Mehemed radibe. Hundirê wî jan dike. Apê Sefo sibê zû radibe diçe doxtorek tîne. Doxtor derziyekê li Mehemed dixe, jana wî disekine. Doxtor dibêje wî bibin Diyarbekîrê, li bajarê Swêregê nexweşxane tuneye. Na, nexweşxane heye, doxtor tunene, alet tunene, derman tuneye. Ji ber vê yekê gava meriv nexweş dibe divê biçe Diyarbekîrê, ger perê meriv hebe meriv diçe Diyarbekîrê an jî li mala xwe, li ber çavên zarokên xwe dihele û dimire. Herwiha Mehemed radikin Diyarbekîrê, doxtorên wir ne dibêjin erê û ne dibêjin na, radibin Mehemed emeliyet dikin. Diya min, pîrîka min û Ferîd diçin ziyareta wî. Mehemed di nav ciyê xwe da digirî, deng nake. Hêsrên çavan bi ser riyê wî da dadikevin jêr. Devê xwe vedike, dixwaze tiştekî bibêje, nikare, dev tê girtin.

Çavên xwe yên qahwerengîn vedike li diya xwe, birayê xwe û xwunga xwe dinêre, melûl û bê çare ye.
Adîle, torina meta Zuloyê Cana, cîranê xalo Mehemed, dostê bav û kalan li nexweşxanê hemşîre ye, diya min ji Adîlê rewşa Mehemed pirs dike, Adîle dibêje wele ez nizanim çî ye? Ji canê wî sê parçe girtin û şandin tahlîlê. Ji Mehemed ra nebêjin, mixabin ew qansêr e.
35
Piştî emeliyetê Mehemed piçek rind dibe, bi xêra dermana rind û qelaw dibe, xwe berhevî serhev dike. Pir najo cardin dikeve. Ferîd wî dibe Swêdê. Lê balafirgeha Swêdî wan radiwestînin, li wir Ferîd digrin û dixin nezaretê. Kaxizê wan kêm e an kêmasiyeke wan heye. Nîmet, birayê Necmedîn Buyukkaya vir de wir de baz dide û kêmasiyan temam dike û Mehemed digîhîne ba doxtor. Çare nîn e! Bersîva doxtor ne dirêj e, kurt û rast dibêje, divê hûn wî rojekê pêş bibin malê, zêde wexta wî nemaye.
Ferîd birayê xwe tîne mal, wî dikin nav ciya, li hewşê, li bin mêwa tiriyê dirêj dikin. Mehemed roj bi roj dihele, bi gotina diya min ne ji mahran re dimîne û ne jî ji mişkan re. Di nav ciyê xwe da, wek berfa ber tîrijên tava biharê dihele, porê wî diwese, hestiyên wî biçûk û zirav dibin. Hundirê wî wekê agir vêketiye, bi lepa cemedê dixwe, fêde nake, agir venamire. Mehemed li ber çav û destên Ferîd dihele û diçe gorê.
Qehra dilê Ferîd giran e, parçeyek ji canê wî, ji ruhê wî winda dibe. Birayê delal, birayê henekvan û kêficweş Ferîd tenê dihêle. Ruhsar û Ferîd vedigerin Anqerê, Ferîd dest bi mekteba xwe dike. heta mekteb xelas dibe Ferîd û Ruhsar li mala Latîfe

xanimê dimînin.
Heta 1974an ez topê dilîzim, lingê minê rastê dişkê, ez topê berdidim. Lingê min li nav alçiyê, ez li mal veketî me, qaptanê min, hevalê hêja Mustefa ji min re "Tiriyên Xezebê" û Ahmedê pismamê min jî kitaban tîne ji min re û mala min dişewitînin! Saya wan da ez jî dikevim ber bayê biharê. Ji wê rojê heta niha min û Mustefa me hevdu nediye. Mustefa û Ahmed ciyê xwe li nav dilê min girtine û wê wiha dom bike.
36
Ez dikevim mekteba Teknîkê ya mêran, roja ku ez ê dest bi mektebê bikim mamostê me dibêje, divê hûn cilên xwe yên atelyeyê bi perê xwe bikirin. Ez gelek aciz dibim û dev ji mektebê berdidim. Demek şûn da ez dikevim Tapû Kadastroyê. Bi çend hevalên Swêregî ez dest bi Tapû Kadastroyê dikim. Em berê li yurda Sêrtê dimînin, pişt re em derbasî xaniyê ku Ahmed tê de dimîne dibin. Ahmed merivê min û Ferîd e, pîrika Ahmed û kalikê min xwung û birayên hev in, wek bavê me li me muamele dike, kêfa me jê re tê, ez bawer dikim kêfa wî jî ji me ra tê. Sibê heta êvarê cixaran dikşîne, gava ji xewê radibe, taştêya xwe bi cixareke qaçax dest pê dike, taştêya wî cixare ye, demekê şûn da ji qanserê wefat dike.
22ê meha qasimê de gava gulle li Ferîd tên barandin û xebera reş digîhîje Anqerê, di nava ewên ku xwe davên otobosê û diçin Swêregê Ahmed jî heye, heta mirina xwe ji Ferîd hez kir, qîmet û hurmeteke mezin nişanî Ferîd dide. Xwedê bi rehma xwe şa bike. Li Anqerê her cara ku fersend çêdibe diçim ba Ferîd, pir caran ez û Ahmed tev diçin wir. Heta saetên dereng em rûdinin û sohbet dikin.

Li Anqerê DDKD ava bûye, nivşên nuh û kevn li nav wê komelê de kar û barê xwe tev dikin, ji wan yek jî Ferîd e, cara yekemîn li Anqerê di bin navê "Şeva Wêranşarê" de şevek çêdibe, di amadekirina vê şevê da Ferîd wezîfa xwe bêqusûr tîne ' cîh. Di nava demeke kin de du grûbên govendê ava dike. Her du grûb beşdarî şevê dibin. Wê gavê ez û pismamê min Misto Uzun û çend hevalên Swêregê em li "Siirt Yurdu" dimînin. Ez li otobusê siwar dibim û diçim Swêregê, niqarevan Remezan û zumevan lawê Rizo digrim û tînim Anqerê.

37

Cara yekemîn di vê şevê de ewê kilamên kurdî bêne gotin, yê ku dê kilaman bibêje Şivan e, wê gavê nav û dengê Şivan tune, zêde kes wî nas nake. Li doraliya sahnê hevalên DDKDê ji laşê xwe bazinekê çêdikin. Qenaeta hevalan ew e ku gava Şivan bi kurdî kilaman bibêje, dê polîs wî bigrin. Hevalan jî biryar dane ku ewê Şivan teslîmî polîsan nekin, ji ber vê yekê li dora sahnê çemberek ava dibe. Herwiha şev bê qeza û bê bela xelas dibe. Demeke tevlihev e, şerekî gur di navbera xwendevanên çep û ulkucuyan (Faşîstên tirk) de dom dike. Ji sibê heta êvarê gulleyan dibarînin ser hêzên çep, xwendevanên pêşverû de, çep di bin gullebarandinê de mekteba xwe dom dikin. Der û dorên unîversîtê û fakulteyan di navbera grûban de hatiye parvekirin. Her kes xwe di mintiqa xwe de diparêze, gava şoreşger diçin mektebê yek û yek newêrin, bi hev ra grûban çêdikin û wisa diçin mektebê. Dewlet temaşekar e.

Di nav DDKDê de munaqeşeyeke teorîk û îdeolojîk dest pê kiriye. Prensîbên komelê vedikin û munaqeşe dikin, bi saetan û bi rojan dipeyivin, dawiya munaqeşeyan nayê. Di warê fikran de

cihêtî û yekîtiyên nû li vir tên çandin.
Di avakirina grûbên ku wê di rojên pêş de ava bibin, ev munaqeşeyên ha sedemeke giran û girîng dilîzin. Yên ku dê rojên pêş de hereketa Kawa ava bikin di nava van munaqeşeyan de ne. Welatperwerên di nava DDKOyê de erkê xwe yê herî girîng tînin cîh. Ev qenaeta min e. Kurd wek millet heye. Pêwestî ev e, di mahkeman de, di huzûra xelkê de ev bê îspatkirin. Welatperwerên di nava DDKDê de û derveyî DDKDê de, gava duduyan davên, gava pêşîn DDKO avêtiye. Di merhela DDKDê de, ronakbîrên kurdan dixwazin rewşa kurdan tespît
38
bikin û li gor wê dermanek binivîsînin. Pêwistiyeke giran e, ji ber ku gava wext û saet temam bû ewê bi hezaran însanên me seferber bin, bi hezaran însanên me dê can û mhê xwe amade bikin, ev ne lîstika zarokan e!
Li cîhanê deveyên (hêştir) qemer bi hev ketine, toz û talaza ku radikin ji Çînê heta Maçînê çavên her kesî kor dike, heşê wan ji serê wan digre. Her kes ji welatê xwe temaşayî vî şerî dike, her kes ji deveyekî re dibe alîkar, her kes kar û barê xwe ji bîr dike û alîkariya deveyan dike. Û deveyên qemer jî bi can û dil dixwazin ku her kes alîkarê wan be.
Baasî, serekên Baasiyan Hasan el-Bekir û Seddam, bi teyareyên Sovyetê, bi top û tanqên Sovyetê, bi efser û qilawuzên Sovyetî gava tevgera Barzanî, tevgera milletê me yê bindest bombardiman dikin, zarokên me, pîrekên me, xort û peyayên me li ber çavên me qetl dikin, em ji Sovyetê re li çepikan dixin û li kurdperwerên xwe jî naletê dibarînîn. Ji ber ku di çavê Sovyetê de Baasî li dijî emperyalîzmê ne, ji ber vê yekê Sovyet bi çek û

leşkerên xwe ji Baasiyan ra alîkariyê dikin, em jî li kuçeyan dikin qarqar û dibêjin, "Bijî sîstema sosyalîst." Di nava vê rewşê de gelek xortên delal û pak ji bo vî şerî ziyan dibin, tên kuştin, birîndar dibin û dikevin hefsan, di nava hefsan û di bin erdê reş de dirizin.

Ferîd diçe komelê û tê, dikeve nav munaqeşeyan û mektaba xwe dom dike. Piştî du mehan ez mektebê ber didim, vedigerim Swêregê. Beriya ku ez vegerim, Reşo bi min re piçekî suhbet dike. Havînê, ew û hevalên din jî dê bên Kurdistanê, divê em tikiliyên (pêwendî) xwe bi hevdu re dom bikin. Reşo dû ra dibe hevalê Ferîd, gava Ferîd diçe daweta Reşo, tê kuştin.

39

Ferîd xwendina xwe ya Fakulteya Zîraetê temam dike, biryara xwe daye, dibêje "Ez ê şoreşgeriyê bikim, ez ê profesyonel bim." Ruhsar dibêje, "Ferîd heyran, Ferîd qurban wiha meke, ka em ê çawa debara xwe bikin, ne karê me, ne perê me û ne jî xaniyê me heye, tu yê çawa profesyonel kar bikî?" Ferîd biryara xwe naguherîne, Ruhsar baz dide ba Brahîm, divê Brahîm û hevalên din bi Ferîd re bipeyivinn. Dawiyê Ferîd îqna dikin.

Tayîna Ferîd bo Hîlwanê derdikeve, wê demê xwendavanên ku bi bursê xwendine kar zû bidest dixin, yên ku bê burs in zû bi zû kar nabînin. Ruhsarê bê burs xwendiye, ji ber vê yekê ew bê kar e, bes kêfa wê cîh da ye, li ba Ferîdê xwe ye, ev bes e.

Lê dixin diçin Hîlwanê. Ferîd dest bi karê xwe dike. Xelkê Hîlwanê, gundiyên der û dora Hîlwanê ji Ferîd hez dikin. Ferîd bi dilê xwe yê pak, bi edalet û dumstiya xwe dilê wan qezenc dike. Jiyana xelkê, zimanê xelkê dizane, bi wan re ne wek

muhendîs, wek hevalekî, wek birayekî dipeyive. Ferîd muhendîsê dewletê ye, meqamê wî, eraba wî ya xusûsî heye, bes ew zarokê vî erdî ye, zarokê xelkê xwe ye, di xizmeta xwe da qusûr nake. Ferîd bi jiyana xwe, bi muemala xwe balê dikşîne, hem bala xelkê û hem jî bala dewletê dikşîne bi ser xwe de. Li vî welatî divê memûr, muhendîs, walî û qeymeqam wek efendiyê xelkê hereket bikin, divê xelk ji wan bitirse, ji wan re hurmetê bike ku giraniya dewletê kêm nebe, roja ku giraniya dewletê kêm bibe, roja ku xofa dilê xelkê sist bibe, dûzan xira dibe, dûzan ji hev da dikeve! Ferîd ji wê imajê re ters dikeve, Ferîd xelkê nake xizmetkarê xwe, şûna wî de xwe dike xizmetkarê xelkê, sînorê di nava xelkê û muhendîsê dewletê de winda dibe.

40

Bêtirê vê yekê Ferîd, kilaman dibêje, kilamên kurdî, Ferîd bi gundiyan re kurdî dipeyive, Ferîd ji destê wî çi bê dike, dibe alîkar û hevalê xelkê.

Ferîd dema bi vî huner û meziyetên xwe dilê xelkê qezenc dike, rol nake, siyasetê nake, îmkanê dewletê ji bo welatperweriya xwe bikar nayne. însanekî medenî û pêşverû çawa hereket dike, ew jî wisa hereket dike. Ferîd ji xwe ra sexşiyetekê ava kiriye û li gor wê şexsiyeta xwe muameleyê dike.

Di nava civateke wek a me da xwedî şexsiyet bûyin karekî hêsa nîn e, şexsiyetên hukum dajo di eslê xwe da bê sexsiyetî ye, li ser nezantiyê, durûtiyê, dijminatiyê û derew û dolaban ava dibin. Ferîd derewan nake, mêrkujî û birakujiyê re rûmetê nade, durûtiyê nizane, dijminatiyê jî nizane. Ji xelkê re ne li gora zengîn an feqîrbûna wan, li gora însanbûna wan muamele dike. Xwe bilind nîşan nade, ji tiştê wisa re îhtiyaciya wî tune. Bi eşîra

xwe, bi perê xwe, bi mark û dolarên xwe pesnê xwe nade, tiştên wisa ji Ferîd dûr in. Ji bav û diya xwe re hurmet dike, ji wan hez dike bes gava bavê wî yan diya wî yan jî mezinekî wî jê re tiştekî çewt bibêje yan jî ji wî tiştekî nebûyinê bixwaze, Ferîd dibêje na û li hember derdikeve. Ji xeybet û paşdaqisekirinê hez nake, ji van dûr e û xwe nake nav tiştên wisa.

Gava ez bibêjim "Çala rêxê" wê çend kes min fam bikin ez nizanim, ji ber wê ye divê ez behs bikim ka "Çala rêxê" çi ye? Wexta ez zarok bûm, yanê di salên 1960an de di nava gelek hewşan da çalên rêxê hebûn, yên ku pez an dewar xwedî dikirin, di nava hewşa xwe da kortikek (çal) mezin vedidan û zibilên heywanan li wir berev dikir. Havînê ji wî zibilî tepikên rêxê çêdikirin û zivistanê bi agirê wan tepikan şîva xwe dikelandin.

41

soba xwe germ dikirin. Germa havînê de bîhn û buxa ku ji van çalan derdiket ne tu hal bû, nefes li merivan dihat birîn. Mêş û kelmêşan ji sibê heta êvarê li ser çalan û wê ava pîs a erqan, dihatin ser nanê te, li ser xwarin û ava te vedinişîn. Wê demê li gelek kuçan de kanalîzasyonê sergirtî tunebû, ava pîs a tuwaletan di nava kuçan da diherikî. Pirê caran mumkun e meriv welatê xwe, bajarê xwe, kuçeyên ku meriv lê mezin dibe romantîze bike. Ez ji viya ra tiştekî nabêjim, bes gava dibim şahidê cehalet û nezaniya însanan, bêyî çalên rêxê tiştek nayê bîra min. însanên ku ji bo perçeyekî erd, ji bo hezar qaxidî an ji bo qiseyeke çewt erd û ezmanan li hev dixe, qala kuştin, dersdayin, namûs û mêraniyê dike madê min li hev dixe û çala rêxê tîne bîra min. Ew çalên ku bi destê zor û zulmê, ew çalên ku bi destê hêzên tarî, hêzên bêbext, hêzên dijminên însan û însaniyetê, ji bo me hatîne kolan.

Ji me ra dibêjin li vê dinê ciyê we ev çalên ha ne, qedera we ev e, hûnê di nava vê çalê de bijîn. Û divê em qebûl bikin ku piştî sed salan, hinekên me hîna ji bo jiyana nav çalên rêxê israr dikin. Ferîd bi şexsiyeta xwe ya serfiraz, serbilind, pêşverû dixwaze xelkê me ji nava vê çala rêxê derkeve, ji vê gend û gemarê, ji vê bîhn û buxa pîs, dilê xwe, canê xwe, mhê xwe paqij bike. Ferîd dixwaze xelkê me serê xwe bilind bike, li pêş xwe mêze bike, pêş xwe bibîne. Dixwaze xelkê me dev ji mêraniya ehmeqane berde, ji xwe re mêraniyeke bi mane, bi zanetî ava bike. Ji xwe re, ji zarokên xwe re, ji mala xwe re jiyaneke xweş ava bike. Mezinbûna Ferîd, qîmet, rûmet, serbilindiya Ferîd, pêşverûtiya Ferîd li vir e, ji vir tê. Meziyetên ku di şexsiyeta Ferîd de tên ba hev, ji bo nivşê me, ji bo xelkê me dibe bingehê şexsiyetên serbixwe, şexsiyetên serfiraz. Şexsiyetên ku jiyana nav çala rêxê qebûl nakin.

43

Rêya min û Ferîd ji hev vediqete

Bê mubalexe kurdperweriya nivşê me di destpêkê de bi rengên çep dest pê nake. Sedemên ku nivşê me dike kurdperwer pirr in, bes di wan sedeman da yên herî girîng hereketa Mele Mistefa Barzanî ye. Li Kurdistana başûr şerekî giran dom dike. Barzanî li Kurdistanê dibe sembolek, dibe efsaneyekî azadî û serfiraziyê. Hal û hewalê tevgera Barzanî, ji her aliyan û bi her babetî digihîje her derên welêt. Di wari salan de radyoya deng û basa Kurdistanê li ser pêşveçûyina kurdperweriyê gelek tesîr dike. Xeber û raporên wê radyoyê, kilam û stranên radyoya Êrîvanê ji bo min qedereke nû û teze ava dike. Jiyana min a rojên pêş destpêka xwe ji vir digre, destpêka min ev e. Ferîd ji min

mezintir bû, ba û bîhna azadiyê ji Kurdistana başûr derdikeve, beriya min gihîştiye Ferîd. Dema Ferîd li Anqerê di Fakulta Ziraetê de dixwîne, di mhê wî de pêlên azadî û serfiraziyê rabûne ser piya, Ferîd ji xewa kabûs şiyar dibe, xewa mirinê, xewa berbad, xewa bê bext û bê wîcdan bi cil û cawên xwe mhê Ferîd terk dike. Ji bo Ferîd bihareke rengîn dest pê dike,

44

Mehmed Şêxo, Cîgerxwîn, Aramê Dikran û dengbêjên din bi kilamên xwe Ferîd dilorînin. Ferîd kurdperweriyê kişf dike, Ferîd kaniya kurdperweriyê, zimanê kurdî kişf dike. Her dest bi çi dike, bi xweşbînî û dilgermiyek bê sinor xwe davêje nav govendê. Bi zemên re dikeve xarê.

Li hefsa Diyarbekîrê Ferîd ji aliyê gelek hevalên xwe ve tê hezkirin, bes yên jê hez nakin jî hene. Di wê demê de kî çi dibêje an kî çi difikire ez nizanim, li ser wê rewşa wan ya hundir hewceyî bi lêkolinekê jî nabînim. Piştî hefsê ez Ferîd jî dibînim, ew însanên ku ji Ferîd hez nakin jî dibînim, heta bi hinekên wan re têkiliya min jî çêdibe. Bê kêmasî ez dikarim bi rehetî bibêjim ku, di navbera wan kesan û Ferîd de ferqeke mezin hebû. Di hefsa 71an de Ferîd ji kurdperwerekî çep zêdetir, kurdperwer e, di helbesta xwe ya Pêşmerge de kurdperweriya xwe nîşan dide, yên wê gavê kurdperwerên çep in, bi çavekî baş li kurdperweriyê nanêrin. Bi ziman û çavên çepê tirk ji wan re dibêjin, ev "Milliyetçî" ne, evana "Milliyetçiyên burjiwazî" ne. Ferîd di hefsê de nakeve nav xebatên perwerdeyê, şûna wê de nivîsandina xwe ya kurdî bi pêş dixe, dinivîsîne û dixwîne.

Li vir divê ez îtirafekê jî bikim. Beriya ku Ferîd di nava hereketa Kawayê de cî bigre, helbest û kurteçîrokên xwe dabûn

min, ji ber ku ez jî dixwazim kurdî bixwînim û binivîsînim. Dîwana Cîgerxwîn û nivîsên xwe dide min, ez alfabeyeke kurdî jî ji xwe re bi dest dixim. Her nîvê şevan ez ji xwe ra kurdî hîn dibim. Daxwaza min ew e ku ez jî wek Ferîd bikaribim bixwînim û binivîsînim. Ez zû fêrî xwendina kurdî dibim, nivîsandin pîçek giran diçe, demekê şûn de riya min û Ferîd ji hev vediqete. Nexweşiyên tevgera çep me hemûyan digre nav pencên xwe.

45

Em her yek dikevin rexekê, ez ji wî pir hêrs dibim, bê guman ew jî ji min gelek eciz dibe. Ji min çend caran nivîsên xwe dixwaze, ez dibêjim, "Na!" Nivîsên wî li ba min dimînin.

Edî ez dev ji kurdî hînbûyinê berdidim, ji ber ku ya herî girîng ne kurdî ye, ê herî girîng, kî çiqasî çep û sosyalîst e! Kes naxwaze tenê kurdperwer û welatperwer be, kes naxwaze xwe nêzî van gotinan bike. Ji van du gotinan her kes baz dide, Divê beriya her tiştî her kes bibe Marksist û Lenînîst û dû ra jî bibe kurd. Armanc ev e, şer ev e. Zimanê me hemûyan tirkî ye, wek kewên gozel sibê heta êvarî şeqîna me ye. Em ferbûna kurdî ji bo rojên pêş dihêlin. Herwiha wext û saet temam dibe ez jî dikevim hefsê, kitab û nivîsên min, bi nivîsên xalo Ferîd ve tev tên veşartin, heta îro jî ez nizanim ku çi bi serê wan nivîsan de hat. Beriya ku grûbên çep çêbin, têkiliya Necmedîn Buyukkaya û Ferîd pir baş e. Necmedîn û hevalên wî yên kevn dixwazin partiya Dr. Şivan ji nû ve organîze bikin. Ji ber vê yekê Necmedîn dixwaze Ferîd di nava vî kar û barî da ciyê xwe bigre. Bes Ferîd ji pêşveçûnên derdora xwe haydar e, têkiliyên wî bi kurdperwerên din re jî heye. Necmedîn bi Ferîd re pir mijûl dibe, her cara ku tên ba hev munaqeşeyên kûr û dirêj dikin. Gava em tev

derdikevin çiyayê Nemrûd, ji Swêregê heta wir bi hev ra dipeyivin, ez li paş wan rûnişfî me, destpêkê de dixwazim guhdarî bikim, lê belê ji dengê seyara me tiştek nagihîje guhên min, bes ew hevpeyvîna xwe dom dikin. Ev têkiliyên wan demeke dirêj dom dike, bes netîceyekê nade.

Ferîd jî wek me her kesî para xwe ji nexweşiyên çep girtibû. Hevalên wî yên ji DDKD a Anqerê di rexê Maoizmê de ciyê xwe girtibûn. Ferîd li gel wan tercîha xwe dike û di rêya xwe da dimeşe.

46

Ferîd dibêje, ger em dixwazin partiyekî nû a Lenînist çêbikin wê gavê divê mirov ji nû ve dest pê bike, em nikarin ser bingeha kevn xaniyekî xweşik û delal ava bikin. Gava Ferîd têkiliyên xwe bi Necmedîn re qut dike, rewş û dîtinên wî ev in. Ji min ra jî wisa dibê, dixwaze ez jî, ji der û dora Necmedîn dûr kevim. Ez wî guhdarî nakim, ez di riya xwe de diçim. Têkiliyên min û Ferîd ji bin de qut dibin.

Bê carekî tenê ez û ew em hevdû nabînin. Ew car jî li Wêranşarê em rastî hev tên. Ahmet Soken hevalekî me yê şoreşger e, hevalekî serbilind û xurt, li Erzeromê di universîtê de dixwîne, Erzerom kela faşîstan e, ulkucî hevalek birîndar dikin, Ahmed ji bo ziyareta wî hevalî diçe nexweşxanê, ulkucî bi rê de ji piştê wî didin ber kêran. Ahmed wefat dike, cenaze tê Wêranşarê. Li Wêranşarê bê hevalên me, Tikko û Kawa jî heye, ew jî dixwazin di cenazê Ahmed de beşdar bin. Hevalên me yên DDKDê û wan bi şertê ku tu aliyek wê sloganên hember Maoîzmê û Sovyetê bikar neynin li hev tên. Bes cardin jî şer derdikeve. Tacoyê me ê Swêregê ku ji Kawayê ye, gurmustek li ser devê hevalekê me dixe, devê lêwik di xwînê de dimîne. Gava

meş xelas dibe, hevalekî me jî diçe bi Ahmed (Pişo) re şer dike. Em şer didin sekinandin, bes hevalên Kawayê êrişî ser me dikin, bêrîka min de kêrek destan heye, ez ji bêrîka xwe derdixim û dixim destê xwe, carekê de dibînim ku Ferîd xwe avitiye pêş hevalên xwe û êrişê tîne ser min, wê gavê hemû însanên doraliya me ji ber çavên min wenda dibin, bê Ferîd kesekî nabînim, ezjê re du caran dibêjim, "Ber bi min neyê, ez ê li te xim!" Bes ew nasekine, destvala ye û cardin jî bi ser min da tê, ez dikevim tengasiyê, ez ne dixwazim li wî û ne jî li yekî dinê xim. Edî dinêrim

47

çare namîne, ez bê hemd dibêjim, "Meyê ser min, tu xalê min î, ez naxwazim li te xim!" Li ciye xwe disekine, ez wisa bawer dikim ku qiseyekî wisa ewê ji devê min derkeve napê, şaş û mat dimîne, li ciyê xwe disekine, ez jî li xwe şaş dibim, qiseyekî wisa çawa bû ji devê min derket. Hevalên me min paşta dikşînin. Gava em digîhîjin Swêregê hevalên min ji bo wê qisê, min rezîl û riswa dikin. Ez dibêjim, "Min çewtî kir, min efu bikin." Hevalên min, wê gavê min ji dil efû dikin an nakin ez nizanim, bes îro ez hêvî dikim ku zarokên ku li ser vî erdî mezin dibin bira tu cara dilê xwe li hev reş nekin, bira nebin dijmênên ruh û canê hev. Dema li Hîlvanê dest bi kar dike êdî Ferîd di nava Kawayê de ye. Hem karê xwe dike û hem jî ji semînerekê baz dide semînereke dinê. Li Diyarbekîrê bi hevalên me yên Devrimci-Demokratan re dikeve munaqeşeyê, de wê gavê jî hevalên me wek muxtarê Diyarbekîrê ne, radibin li Ferîd û hevalên wî dixin, di nava kuçeyên Diyarbekîrê de bera wan didin. Di wê demê de û hîn niha jî, em demokrasiyê wisa fam dikin û wisa tetbîq dikin, yên ne ji min, dijminê min e û dijmin divê ji holê rabe, divê cil

û cawê xwe bar bike û ji mehela min, ji gundê min û ji bajarê min koç bike. Ger ew koç neke, ceza wî lêdan û kuştin e. Zihniyeta me ya demokrasiyê ev e. Lêdan û tehdît çavên Ferîd natirsîne, diçe Adiyamanê li wir bi hevalên me re dikevin nav munaqeşeyeke gur. Lingekî Ferîd li Hîlwanê û lingekî wî li bajarên din e. Hevalên wî yên Kawayê ji enerjiya wi re heyran dibin, ne tenê hevalên wî, yên Ferîd carekê nas dike carekî dinê ji Ferîd dûr nakeve.

Di warê siyasî de giraniya Kawayê wek DDKD fireh nîn e, bes giraniya Ferîd di warê sosyal û civakî de mezin e, têkilî û

48

tesîra wî li ser gundiyan û karkeran zêde ye. Ji bo xwe ez dikarim bibêjim ku ez vê giraniya wî ferq nakim, hebûn û tunebûna wî li rojê pêş wê çawa tesir bike û çawa tesir dike ez pir dû ra fam dikim.

Dema Ferîd li Hîlvanê dest bi kar dikê, li Swêregê hevalên wan zêde tune ne, grûbek ji TÎKKO vediqete, di nava vê grûbê de Eyyup Surek heye, bes li Swêregê em ji wî re dibêjin Mao Zedung, ji ber ku pir dixwîne, hemû teoriyên Mao ji ber dizane. Ev heval diçin ba Ferîd. Dixwazin têkiliya xwe bi Ferîd re deynin. Hevdu dibînin, bi hev ra dipeyivin û bi dilxweşî ji wir vediqetin. Ev gmb ewê di rojê pêş da bingeha Kawayê li Swêregê fireh û xurt bike. Beriya kuştina Ferîd ev heval ji Kawayê vediqetin, bîr û baweriya wan bi teoriya sê dinya nemaye, ji wan re dibêjin Kawa Red û yên din dibin Dengê Kawa.

Piştî kuştina Ferîd Dengê Kawa tenê du hejmarên kovara xwe çap dikin, hejmara yekemîn ji serî heta dawiyê der heqê Ferîd de

ye, li ser qapaxa kovarê rismê Ferîd heye.
Kawa Red, bi navê Kawa sê hejmar kovar derdixin. Hejmara pêşîn di meha Çileyê (Meha 12.) pêşîn 1978an de derketiye, meha piştî kuştina Ferîd de derdikeve, bi kelîmeyekê jî behsa Ferîd nake. Hevalên ku kovarê derdixin ji Ferîd veqetyane, bes Ferîd şoreşgerekî delal e, gulleyên bêbext ne tenê li Ferîd, li me hemûya hatine barandin, vê rastiyê em zû bi zû fam nakin, gava em fam dikin êdî dereng e. Bê guman ez naxwazim li wan neheqiyê bikim, tavirên wisa di nav hemû grûbên çep de heye, gava şoreşgerek tê kuştin tenê grûba wî lê xwedî derdikeve, grûbên din xwe kor û kerr dikirin.
49
Tayîna Ferîd tê Swêregê, Ferîd û Ruhsar dikevin xaniyê Apê Sefo û Ferîd li Swêregê dest bi karê xwe dike, ciyê karê wî li kêleka şûbeya Eskeriyê ye. Tayîna Ruhsarê hîn demeketiye, rojên wê bi apo Sefo û dakê Kejo ve derbas dibin. Ew rojên ku bi Apê Sefo re derbas dibin, di jiyana Ruhsarê de rojên herî xweş in. Apê Sefo bi çîrok û meselên xwe yên renganî rojan li pê hev dixemilîne, Apê Sefo bi zanetiya xwe her roj paceyekê li ber çavê Ruhsarê vedike, gava Ruhsar ji wan paceyan li dinê dinêre, êdî ji kêfan ji ser hişê xwe diçe, ew her roj tiştekî hîn dibe, her roj tiştekî fahm dike.
Ev roj wek xewnên şevan kurt in, ne hayê Ferîd û ne jî hayê Ruhsarê ji rojên pêş heye. Tu kes nizane ku sibê wê çi bibe. Em hemû grûbên kurdperwer, bi zeman re ketine xarê, ji nalên hespên me agir dibare, em saniyeyekê jî li dawiya xwe nanêrin, çavên me hemûya li ser noqteyek pêş bel bûye. Divê em beriya her kesî xwe bigîhînin wir, riya azadî û serfiraziyê amade û ava

bikin. Rojên pêş wê ji me re çi astengan bîne û çi neyne ne girîng e, çi tîne bira bîne, ser seran ser çavan.
Em hemû xortên kurdperwer wisa difikirin û wisa dijîn, rewşa mhê me wisa ye.
Li Swêregê hemû grûbên kurdperwer di nav merhaleyek kurt de çêdibin. Destpêkê da navê me hemûyan di nava xelkê da "telebe" ye, bi xelkê re têkiliyên me yên zêde û fire tune. Munaqeşeyên îdeolojîk bi hemû giraniya xwe dom dike. Herî pêşîn kovara Rîzgarî digîhîje Swêregê, li ser tezên kovarê qiyamet radibe, dibêjin, ev milliyetçiyên kurda ne, yanî ew kurdperwer in. Di eslê xwe de ev êrîşa hanê êrîşa çepê tirkan e, ew çepê tirk ku, gava ez vê nivîsarê dinivîsînim ew ji bo pîrozkirina Peymana Lozanê, li Lozanê dimeşin.
50
Herwiha gotina min ew e ku, em, xortên kurdperwer yên li Swêregê gora rewşa cîhanê û rewşa çepê tirkan reng û siyaseta xwe tayin dikin. Gmbên ku li Swêregê li ser bingehek wisa ava dibin an jî bûne.
Li Swêregê komela "Kultur Sevenler" heye, wext û zemanê xwe de xwendevan û pêşverûyên Swêregê vê komelê ava dikin, komele ji xortên Swêregê re alîkariyê dike ku ew mektebê bixwînin.
Demek şûn da kar û barê wê komelê disekine, em kurdperwerên Swêregê îmza berev dikin û komelê dibin kongreyê, di kongreyê de em komelê digrin.. Êdî komela Kultur Sevenlerê dikeve destê nivşekî nû, nivşekî ku sibê heta êvarê bêyî azadî û serfiraziyê behsa tiştekî din nake, gelek pêşverû û welatparêzên rojên pêş ji vir derbas dibin. Pir naçe hindik naçe, dîtinên nû, bîr

û baweriyên siyasi wek gurekî têkeve nav pez, me ji hevdû cihê dike, diperçiqîne, serê me her yekî li alîkî dikeve. Ji hev cihêbûyin zêde muşkule nîn e, yên ji bo rojên pêş dibe mişkule, ew bîr û baweriyên ku me ji hev re dike dujmin, me ji hev re dike neyar e. Di rojên pêş de em di nav tasek av da qiyametê radikin, çav çavan nabîne.

Herwiha di 1978an de şûbeya DDKDê li Swêregê ava dibe, Kultur Sevenler dikeve paş, ya li pêş cî digre DDKD ye. Xortên Swêregê li pê hev komelên xwe yên demokrat ava dikin. DEVDER (Devrimci Gençlik Demegi), KOY-DER (Koylulerle Dayanisma Demegi), DDKD (Devrimci Demokratik Kultur Demegi) şûbeya Swêregê, HALK-DER (Halkla Dayanişma Demegi), ASK-DER (Anti-Somurgeci Kultur Demegi), Komela Fimeciyan, Komela înşaatçiyan, Komela Karkêrên Aşxanan di

51

warê demokrasiyê de ciyê xwe digrin. Divê em Komeleyên mamûr û mamosteyan jî li wan zêde bikin.

Swêreg di nava du salan de, 77 û 78an de dibe du perçe, aliyek ez bi tevayî dikarim bibêjim cebheya pêşverûyan, ceebheya din jî ya paşverûyan e. Ew hêzên ku dixwazin dem û dewrana salan bidomînin destê xwe didin hev û li hember cebheya pêşverûyan dikevin nav çeperên xwe. Li ser pêşverûyan agir dibare, asayîş û huzûra Swêregê ji kok ve tê hilweşandin, şêlandin, kuştin, fidyexwestin, pîrek û qîz rehîn girtin dibin bûyerên rojane.

53

Di 78an de Swêreg

Ez dixwazim rewşa Swêregê bi hawakî xweşik nîşan bidim

ku, bira em bikaribin bûyerên ku di rojepêş de tên serê me hemû kurdperweran baş bê famkirin, ji wan re îzehetek bê dîtin. Bê guman li Swêregê grûbên din jî hebûn, car ez bi dilpakiya xwe dibêjim ku piraniya xortên di nava van grûban de kar dikirin zarokên kurdan bûn û bi dilpakiya xwe di nav vê xebatê de ciyê xwe girtibûn, wan jî wek me, li gor dîtin, bîr û baweriya xwe xebat dikir.

1977an de DDKD li Diyarbekîrê ava dibe, ji mehan, meha îlonê ye. Li Anqerê hukum di destê MC (Milliyetçî Cephe) de ye. Beriya ku DDKD çêbibe me Komela Kultur Sevenlerê kiriye faeliyetê, û em karekî xurt didomînin. Raketin û rawestan tuneye, gava em çend saetan radikevin cilên me jî li me ye, her deqîqe em amade ne. Di demeke gelek kurt û intensîv de em pêwendiyên xwe bi hemû beşên civatê re ava dikin. Di nav mamoste, memûr, necar, gundî û xebatkaran da heval û sempatîzanên me çêdibin. Di nav paleyên nîskan da em xebateke

54

xweş dikin, sibê zû gava emele wê li qamyonan suwar bibin, em jî li wir in, bi wan ra dipeyivin, derdên wan guhdarî dikin û ji wan re riya xwe organîzekirinê nîşan didin, cama em jî bi wan re diçin ser erdan û kar dikin.

Em diçin gundan, bi gundiyan re têkîliyê datînin, hevaltî, bîr û baweriya wan qezenc dikin. Bi şevên tiyatroyê jin û qîzên Swêregê cara yekemîn e ji hundirê malên xwe derdikevin. Tiyatroyê temaşe dikin, di nava molayê de helbest û kilamên kurdî guhdarî dikin. Ba û bîhna azadiyê dikin dilê xwe û vedigerên mala xwe.

Dewraneke nû dest pê kiriye, dayik û bavên ku qîzên xwe

naşînin mekteban, gava qîzên wan tên Kultur Sevenlerê êdî zêde dengê xwe demaxin. Wê tiştek neyê serê qîzên wan, dizanin û bawerî tînin.
Nivşê DDKO hebûna kurdan îspat dike, nivşê DDKDê, nexweşiya welatê me û çareserkirina wî di warê îdeolojî de tespît dike. Nivşê me vî dermanê çareserkirinê digihîne xelkê, ji xelkê re rêya xelasbûnê nişan dide û di warê pratîkê de wan serwext û mobîlîze dike. Li Swêregê rewş ev e, ez naxwazim wek mêzîndar, kîjan grûbê di vî kar û barî de çuqasa alîkar bûye an keda wan çi qas e, li mêzînê xim. Ev kar ne yê min e.
Dema ku DDKD ava dibe, reng û ciyên grûbên din jî belî bûye. Li gor bîr û baweriya xwe hemû grûbên çep di nav tevgera kurd de xwe nîşan didin. Perspektîfên çewt û şaş dibe sedem ku gelek caran em bi hev ra şer dikin, wek dîkên li ser kulikan her grûb kulika xwe diparêze. Enerjî, wext û keda me bîlaheq û bîlasebeb telef dibe. Bê guman ez dikarim bibêjim nîvê wexta me ji bo wê leca dîkan heba dibe. Herwiha li Swêregê hedîsên
55
balkêş dest pê dikin. Ehlên Swêregê li mala xwe, li kuçan tên şelandin, pîrek û qîzên xelkê rehîn tên girtin. Yên van karan dikin ji xelkê xûgiyê dixwazin, pere yan jî zêr. Xelk ji fedyan nikare dengê xwe derxe, cesareta kê heye ku bibêje jina min an qîza min revandine. Mesala namûsê ye, meselekî hesas e, xelk bi dizî pere an zêr ji dost û nasan berev dike û jin û qîzên xwe xelas dikin. Kî vî karî dike kes nizane, bes li gor rîwayetan mahkûmên ku pişta xwe dane axayekî yan jî eşîreteke mezin van karan dikin. îhtimal e ku pir caran xebera axa û eşîretan tuneye ku mahkûmên wan bi van karan ve mijûl dibin.

Edî xelkê Swêregê êvaran newire derkevin der, piştî saet sisêyan her kes dikeve mala xwe û deriyên xwe kîlît dike. Qahwexanên Swêregê êvaran vik û vala ye. Polîs û cendirme zêde naçe ser van bûyeran.

Li kurdistanê û bi taybetî li Swêregê kurdperwerî di nava xwendevanan de her ku diçe fire dibe, bayê siyasetê herî xurt di nav mekteban de ye, ew mektebên ku zarokên me asîmîle dikin, dibin argûnê agirê azadî û serfiraziyê. Xortên kurd di nav dîwarên mekteban de hem fizîk û matamatîk hîn dibin û hem jî kurdperweriyê keşf dikin. Kêfa dewletê ji vê pêşveçûnê re nayê. Mekteb li pê hev tên girtin. Behaneya îqtidarê, pevçûna nav grûban e, dibêjin "Fraksiyonên çep sibê heta êvarê bi hev ra şer dikin, demança bera hev didin, ji ber vê yekê em nikarin perwerdeyê bidin domandin, mecbûr em mektebê wisa digrin."

Lîseya Meslekî ya Swêregê tê girtin. Doba lîseya normal e, grûbên Swêregê tên ba hev, divê ew vê behaneya îqtîdarê ji destê îqtîdarê bigrin. Li hev dikin ku tu kes wê li lîseyê belavok bela neke, forûm çê neke û bi hev re şer neke. Ji grûban yek vê

56

biryarê nas nake. Ger ez ne xelet bim cara yekemîn di nava kurdperweran da demançe diteqe. Ji hevalên me yek û ji wê grûbê jî yek birîndar dibin. Cardin di wan rojan de di nava camêrekî TÎKOcî û hevalên DDKDê de şer derdikeve, gulle tên barandin, kes birîndar nabe. Demekê şûn da hevalên DDKDê û TÎKOcî dikevin rûyê hev, di vê biiyerê de Remezan Can tê kuştin û xortek birîndar dibe. Car bi car grûbên kurdperwer bi hev dikevin bes ev cara yekemîn e jiyana xortekî heba dibe û xortek din heta ber destê ruhstîn diçe û vedigere. Ew bûyer hemû piştî mitîngê

dest pê dikin, bûyer li pê hev tên, du-sê rojan carê hadîseyek çêdibe, sedemên xuya dikin, di nava mektebê de fomm, belevok belavkirin an jî afîş pêvekirin e. Dîwarên Swêregê bi sloganan hatîne xemilandin, cama grûbek diçe, wan pak dike û sloganên xwe dinivîsîne, ew jî dibe sedemên pevçûnê. Hewa siyasî ya Swêregê wek têlên tenburê tên şidandin. Xelk û xortên Swêregê wek li ser êstiriyan rûnin. Her kes xwe dipê û diparêze. Bêdengiyeke giran daketiye ser Swêregê. Her kesî çav û guhên xwe bel kiriye, kes nizane rojên pêş wê bixwe re çi bîne. 22 qasima 1978an de qedera Swêregê tê guhertin. Kulîlkekî wek Ferîd ji axa xwe tê qetandin. Lê li dû Ferîd wê gelek kulîlk jêbibin, bes xebera me jê tuneye. Bê hay û bayê rojê pêşîn em hespên xwe xar didin.

1978 saleke gelek girîng e, sedemên bûyerên rojên pêş di vê salê de xwe eşkere nîşan dide, girêkorkên di nav salan de hatiye girêdan, yên van girêkorkan girêdane mecbûr dibin, xwe nîşan bidin, di warê siyasetê de bi bejn û bala xwe dikevin meydanê. Li vê meydanê her kes ciyê xwe digre, kî çi dibê, kî çi dike li ber çava ye, tiştekî veşartî tuneye.

57

Derd û kulên salan gur dibe, zêde dibe, wek bi hezaran însan li dora agirê çaralî bin û pufî agir bikin. Mal û malbat şêlandin di vê salê de dibe hunereke rojane, yên van kar û baran dikin dest û piyên xwe li ba dikin û digerin, ji aliyê çek û cebirxanê kêmasiyeke wan tune, dûrbîn, bombeyên destan, tifingên otomatik, her tiştê wan heye. Gava davên ser malan, gunehê wan bi kesî nayê, li gel wan ferqa jin û mêran tune, zarokan jî efû nakin. Eşqiyayên bi van karan mijûl dibin, roj bi roj metodên

xwe pêşda dibin, xwendin û nivîsandina wan temam e, beriya ku bavên ser malekê, ji xwediyê malê re name dinivîsînin, di bin van nameyan da navê DDKDê heye. Divê yên piçekî heş li sêrî heye bifîkire, li welatê me bi hezar salan ve ye ku eşqiya hene, ev camêrana heq an neheq ji edaletê bazdane û ketine çiyan, bes ez heta niha şahîd nebûme ku evana beriya ku mal û mulkên xelkê bişêlînin, rûdinin, kaxet û qelema xwe derdixin nameyeke xweşik dinivîsînin. Di 1978an de mekteba Îmam-Xetîb tê şewitandin, yên mektebê dişewitînin nameyekê jî li wir ber didin, di vê nameyê de navê DDKDê cî digre. Hukumet li bûyera temaşe dike, yên malê wan tên şêlandin gilî dikin bes netîceyek dernakeve. Giraniya hukmatê li ser pêşverûyan û welatperweran xwe nîşan dide. Piyesa "Qelen" tê qedexe kirin. Yê biryarê dide waliyê Ruhayê ye, ji bo tetbîqkirina biryarê walî ji Ruhayê teqwiye dişîne Swêregê. Li doraliyê Swêregê teqîna tifînga ye, bêhejmar eşîr bi hev re şer dikin, ev şerê gundî û eşîretan bi rojan dom dike, dengên tifingan digihîje Swêregê, hukmat temaşe dike, ne teqwiye û ne jî mudaxele dike.

Di meha Kanûna pêşî de Ecevît hukemeta xwe ava dike, Milliyetçî Cephe ji îqtîdarê dikeve, yanzdeh milletvekîlî ji

58

Partiya Edaletê (AP) vediqetin, Ecevît bi saya van yanzdeh kesan hukumeta xwe ava dike.

Li Swêregê jiyana rojane dom dike, camêrekî bi navê Halef Korkut li ser rêya hefsê tê kuştin, mudurê Lîseya Meslekî Alî Uslu tê kuştin, mekteb mehekê tê girtin. Ji eşîreta Qeregiçiyan du kes li nava Swêregê tên kuştin, yek jî birîndar dibe. Li Heçxidirê, hinek pêşiya leşkeran dibirin, ji destê wan sê heb girtiyan

digrin û li wir wan dikujin. Meha Kanûnê xelas nebûye, pênc heb eşqiya davên ser mala Şukm Utkun, li ser sifatên wan maske heye, bi destê zorê li mal çi pere û zêr heye bi xwe re digrin û diçin. Cardin wê rojê bi şev li Hecxidirê eşqiya rê dibirin, ji şofêr û rêwiyan nêzî 40 hezar pere berhev dikin, dest û piyên xwe li ba dikin û diçin.

26ê Kanûnê de bûyerek balkêş heye. Li ser riya Çêrmûgê du eşqiya û polîs rastî hev tên, di nava wan da şer derdikeve, di destê polîsan da demançe, di destê eşqiyan da tifîngên otomatîk hene, her du polîs li wir tên kuştin. Ev her du mêrkuj demek şûn da tên girtin. Ji wan yek ulkuciyekî bi nav û deng e, sûcê xwe qebûl dike, dibêje "Min û refîqê xwe, me gelek mal şêlandin û me ji gelek kesan fîdye girt." Polîs zêde naçe ser wan, der û dora wan da kî hene, kî ji wan re alîkariyê dike, ji bo çi van karan dikin nayê pirsîn. Piştî kuştina polîsan nihayet teqwiye ji Ruhayê tê Swêregê, xelkê Swêregê hêvî dike ku polisên niha biçe ser eşqiyayan û wan yekayek bigrin. Êdî qanûn û huzûr wê were Swêregê bes wisa nabe, polîs êrişî çefîyên serê xelkê dikin, çefî ji serên xelkê tên girtin, li ber çavên wan tên çirrandin. Bi çefi berevkirinê asayîş nayê Swêregê, reqîn û teqîn berdawam e. Hevalekî me Şevket Aytaş bê sedem û bê sûc li

59

riya mala xwe tê kuştin. Li Stenbolê faşîst bombe davên ser xwendevanên huqûqê, heft xwendevan tên kuştin, ji wan yek hevalê me yê delal Hemîd Aqil e. Di meha Adarê de em Hemîd dibin Mizarê û defn dikin. Li Swêregê û Diyarbekîrê em Suat Karataş û Yahya Mehmedoglu re alîkarî dikin, em dixwazin ew her du bibin reîsê belediyê. Li Diyarbekîrê em li hember xalê

Mehdî Zana alîkariya Yahya dikin. Li Swêregê ger em bixwazin, em karin namzedek bi serê xwe bijcin reîsê belediyê, hêz û teqeta me ya wê demê bes dike. Gor biryara hevalên Devrimcî Demokratan em piştgiriya namzedê CHPê dikin. Namzedê CHPê Suat Karataş e. Xwedê bi rehma xwe şa bike, ne mirovekî xirab e, însanekî mulayim û mutewazî ye. Hember welatperweran nîn e, li ba welatperwera ye, bes divê welatperweran namzedek bi serê xwe derxista. Ne tenê ji bo Swêregê, wê ji bo her derê welat, biba semboleke pêşveçûn û serketinê.

Swêreg projeyeke pîlot e, plan û kemînên li wir ava dibin, dezge û dolabên li serê pêşverûyan çêdibin, gav bi gav li bajarên din jî tên tetbîqkirin. Li gor bajarên din Swêreg pir pêşde ye, polîtîzebûyin pir bilind e. Xelkê reben û feqîr li ba xwendevanên xwe cî girtiye, yên neheqiyan protesto dikin, dimeşin, civînan çêdikin êdî ne telebe ne. Pirên ku bi keda şev û rojan ava dibe xelk û pêşverûyan digihînin hev. Ev berhevhatin xofe dixe nav dilê kevneperestan, xewên şevan li wan diherime.

Şerê eşîretan wek her tim berdewam e, bîhna barûda 78an da bi giraniya xwe daketiye ser Swêregê. Qeregiçî û îzol 1974an de dest bi şer dikin, şerê wan heta 1978an dom dike. 1976an de Alxas û Kelexanî bi hev dikevin, dîsa di vê salê de, Mizrayic-Hedro û Suryan û Razan jî dest bi şer dikin. Ji heşt kesan zêtir însan tên 60

kuştin, hinek dibin fîrar û hinek jî dikevin paş dîwarên hefsan. 1977an de doba Dêsman û Tuvireka tê, bi hev dikevin, wek her carî li dû xwe mirin, hefs û macirtî ber didin.

1978an de Suryan û Kelaxan şer dikin, ev şera bi rojan dajo, di dawiya vî şerî de koka Suryana hişk dibe, hem ji canê xwe û

hem jî ji gundê xwe dibin. Kelexanî gundê wan bi erdê re dûz dikin, serek û serkarên Suryana tên kuştin, çend hebên ku dimînin, cil û cawê xwe berev dikin û dikevin riya macirtiyê. Li der û dor kozikên şer de bi sedan derbên MKE (Endustiriya Makîne û Kîmya) tên tespîtkirin.
Mahmûd Ecem li hember mala Bucaxan şer dike, bes şerê Mahmûd dûr û dirêj najo, şerkarên Mahmûd zarokên wî ne, Mahmûd pişta xwe daye zarokên xwe, bombeyekê diteqê, zarokên Mahmûd Ecem tên kuştin, pişta Mahmûd dişkê, ew û mala Bucax li hev tên.
Herî dawî 1978an de şerê navbera Bucax û Qirwar hatiye rawestandin, wek agirbirînekê çêbûye. Her du alî li ciyê xwe rûdinin, ji bo şerekî nû hêzen xwe ji nû ve didin dûzanê, plan û kemînên nûh çêdikin. Gava şerê Swêregê dest pê dike Qirvar li aliyê PKKê giraniya xwe datîne. Şerê eşîra ne bes, îcar li Swêregê derdê avê dest pê dike, wê salê zêde baran nabare, gundiyên dora Swêregê, pez û dewarên wan bê av dimînin. Xema kesî nîn e, yên dikarin ji gundê xwe koç dikin.
Li mintiqa Hekariyê kurd bi hev dikevin, hêzên YNK (Yekîtiya Niştîmana Kurdistanê) û Qiyadeya Muwaqet hevdu perîşan dikin. Serekhêzên Yekîtiyê Elî Eskerî û nêzî 600 pêşmergên wî tên kuştin. Dewlet mudaxele nake. Piştî ku şer xelas dibe di meha îlonê de tdtbîqata KanatIi-78 çêdibe. Ciyê
61
tetbiqat çêdike Gever (Yuksekova) e. Li ser hêzên dijmin cilên kurdî hene.
Xelkê Swêregê, ji bo protestokirina tunebûna asayişê meşekê plan dike. Esnaf dixwaze dikanên xwe kilît bikin û bi çelengekê

ve kilîtan teslîmê qeymeqamê Swêregê bikin.
Waliyê Ruhayê tê Swêregê tebdîlî qiyafet dike û dixwaze derd û kulên Swêregê bi guhên xwe guhdarî bike. Komela Alîkariya Gundiyan lê Gulanê bi mitîngekê pîroz dike.lOOO komando û polîs çaraliyê meydana Qanêqûyê dixin çemberî. Mitîng bê bûyer xelas dibe. Eynî roj saet di 20an de du eşqiya, li Silimpiyarê dixwazin qamyonekê bişêlînin, bes bi ser nakevin, her du jî tên girtin. Eşqiyayek ji gundê Qerexana ji Bismilê ye, yê din jî, ji gundê Qiraxaça Hezroyê ye. Êdî eşqiya ji bajar û gundên derveyî Swêregê tên Swêregê ku xelkê bişêlînin.
Li Ruhayê ulkucî endamê DDKDê Şevket Ozlahlan birîndar dikin. Şevket li Tip Fakultesiya Diyarbekîrê çavên xwe digre. Di cenazê Şevket de Swêreg hemû radibe ser piyan, pîrekên bi çarşevên lacîwerd feryad û fîgan dikin. Nêzî 20 hezaran însan bi sloganan Şevket defn dik'n.
Meha Teşrînê koça mezin dest pêdike, yên kane mala xwe bar dike. Rojnama îrfan xebera koça mezin wisa dide:
"lê Çiriya Paşîn 1978. Li Swêregê koça mezin dest pê kir. Bûyerên ku li Swêregê çê dibin dawî li sebir û tehamula xelkê hanî. Yên dikare mal û mulkê xwe bifroşe, bar dikin û diçin. Li ser deriyê xaniyan de îlanên fîrotanê hatiye daliqandin.
Yên erd û xaniyê xwe difroşin elelecele bar dikin û diçin bajarên din."
62
Yên koç dikin xwediyê mal û mulk in, lê belê bê qewet û bê pişt in. Zora wan tune ku xwe biparêzin. Piraniya mal û malbatên wisa nameyên tehdît û fîdye digrin, yê name negirtiye

nema ye.
Yê xugiyê nade, tê şêlandin, pere û zêrên wan bi destê zorê tê girtin. Eşqiya dest bi rehîngirtinê jî kirine, ji bo xûgiyê pîrek û qîzên xelkê direvînin.
Êdî însanên bê hêz nikare li Swêregê bijî, mafê wan ê jiyanê ji holê hatiye rakirin.
Li vir divê em çavekî bavên hukmatê, gava eşîrên Swêregê mezelên hevdu dikolin, gava hemû pêşverûyên Swêregê ji bo serwextkirina gundiyan, xebatkaran, esnafan şev û rojên xwe dikin yek, em binêrin hukmat çi dike û çi difîkire. îqtîdar di destê Ecevît de ye, Selahattin Tîmûr mudur û semivîskarê rojnama îrfanê ye. Di hejmarek îrfanê de wisa dinivîsîne: "Rojeke havînê, di sohbetek qahwexaneyekê de ku çend abûqat jî hazir bûn, min ji dozgerekî me eynî gazin dikir. Ji kerema xwe ra hêzên ewlekariyê gazî ser vatiniya-wezifeya wan bikin. Van sîlehên ku berra huzûra millet didin rawestînin, ewlekariya mal û canê milet pêk bînin. Bersîva min:
-Ez nikarim hêzên ewlekariyê têxim vê mucadeleya mirinê.
Di meha Tîrmehê de Wezîrê Hundurîn îrfan Ozaydinli tê Swêregê, ji balkona belediyê dengê xwe bilind dike. Li Swêregê em ê emniyeta can û malê we ava bikin, bes yên li ser dîwaran sloganên îdeolojîk dinivîsîne ji eşqiyayên li ser çiya talûketir in. Wezîrê Hundirîn diçe, li pê wî yekîneya komandoyan tê Swêregê, herî pêşin sloganên li ser dîwaran elelecele tên paqijkirin. Bes şerên nav eşîran û şêlandina xelkê dom dike.
63
Beriya mitînga DDKDê, hember bihatiyê, faşîzmê û şêlandinê Halk-Der mitîngekê çêdike. Bi hezaran însan dikeve

mitingê, mitîng bê bûyer xelas dibe.
Piştî Halk-Der, şûbeya DDKDê ya Swêregê ji bo protestokirina van bûyeran mitîngeke dinê çêdike, bê goman gelek şûbeyên DDKDê di mitîngê de ciyê xwe girtibûn, bes yên girîng bi hezaran xelkê Swêregê; jin, mêr, zar û zêç, kal û pîr, ji hemû salan û ji hemû beşên civatê însan di mitîngê de tên ba hev. Ev mitînga ha dibe îspata xebata me ya şev û rojan, dibe hawarek li hember zulm û zorê, erdê Swêregê bin lingên hezaran de dihêje, qîz û pîrekên nav çarsefên reş de, wek dîwarên Kela Diyarbekîrê li dora civînê çembereke fîre û dirêj ava dikin. Li ser Kela Swêregê qomando rêz bûne, tifingên wan li dest, çavê wan li me ye. Çaraliyê me tije leşker in, gelek teqwiye hatiye, meydana Qanêqûyê û kuçên doraliya meydanê heta qirikê xelkê tije kiriye, lîlandinên pîrekan dilê dostan ji kêfan dilê dijminan ji tirsan dilerizîne.
Qet ji bîra nakim, di wan rojan de deve hatibûn dizîn, beriya ku ez peyva xwe dest pê bikim hevalan ji min ra mesela deva behs kirin. Xwediyê deva hatibû ba hevalên me û alîkarî xwestibû. Di nava peyva xwe de min got yên deve dizîne em dizanin kî ne, ger ew devan bemedin, em ê bi hezaran însan re êrişê bibin ser wan. Gava mitîng xelas bû, deveyên me jî azad bûn. Xeber hat, gotin deve berdane, deve wane li kuça Hurriyetê dimeşin. Piştî çar saetan mitîng bê qeza û bê bela xelas dibe, lê bûyer dom dikin.
Du roj piştî mitîngê keçikek 10 salî tê kuştin, bayiyekî Tekelê tê kuştin, kesekî din li kuçê tên kuştin.
64
Çend roj şûn da li kuça Hurriyetê şer derdikeve, ji Halk-Ûerê

Remezan Can tê kuştin û endamê me Muzaflfer Alkoyun jî birîndar dibe, ji ber vê yekê mektebên lîseyê ji bo hefteyek tên girtin.
Du yan jî çar roj piştî kuştina Remezan Can, Ferîd tê kuştin. Rojnameya îrfan xebera kuştina Ferîd wisa dide:
"Ferîd Uzun ji aliyê destên nenas, bi bêbextî hat kuştin. Xortê bijarte yê Swêregê muhendîsê bilind ê ziraetê Ferîd Uzun di 22. 11. 1978an de li ber mala xwe, dema ew û keça xwe li erebê siwar dibin, bi destên qirêj ên bêbext hat kuştin. Mêrkuj ji destpêka sibê li benda Ferîd bûye ku ew were malê. Mêrkuj xwe nêzikî Ferîd dike û bi pênc derban Ferîd dikuje û hevalekî ku li ba wî ye jî birîndar dike.
Ferîd Uzun di sala 1945an de li Swêregê tê dinê, ew piştî dibistana destpêkê û navînê, li Fakulteya Ziraetê ya Anqerê di sala 1 975an de dibe muhendis. Wî dema li Fakultê dixwend, bû têkoşerê rîzgariya xelkê xwe. Ferîd Uzun li dema rejîma 12ê Adarê de di mahkemeyên eskerî yên Diyarbekîrê de hat mahkemekirin û pênc sal ceza hefsê girt. (Ceza ne pênc sal bû, 14 sal bû. P.U) Wî di dadgehan de bi mêranî doza xelkê xwe parast.
Ferîd Uzun di hemû jiyana xwe de ji bo ku xelkê wî jiyaneke xweştir bijî, li dijî kolonyalîzmê, emperyalîzmê, faşîzmê û kevneperestan têkoşiyaye. Cenazeyê Ferîd Uzun roja 23. 11. 1978an piştî nimêja nîvroyê, li ser milê hevalên wî yên têkoşer û hêjmareke mezin ya xelkê bo
Goristana Asrî hat anîn û li wê derê hat defnkirin. Qatîlên Ferîd Uzun Ferîd nekuştin, lê ew di nav dilê gelê xwe da bû abîdeyek nemir. Bîranîna wî, wê bibe rêbera mirovatiyê."
65

Ji destpêka meha Kanûnê heta roja ku Ferîd tê kuştin, li Swêregê û li gundên Swêregê 44 kes tên kuştin, 1 6 kes birîndar dibin, 8 şêlandin, sê heb rehîngirtin çêdibin. Tevî hev çar kes tên girtin, du hebên wan mêrkujên polîsan e, du hebên dinê şêlankerên biyanî ne, yek ji Bismilê û yê din jî ji Hezro ye. Di vê demê de polîs û cendirme 3 demançe, 4 carcor û 21 heb fişek bi dest dixin. Ez van hejmaran ji xeberên rojnama îrfanê derdixim, xeberên resmî ne, li ser raporên polis û cenderman çêbûne.
Di nav van hejmaran da bûyerên ku neketine raporan cîh negirtine, ji ber vê yekê em dikarin bi rehefî bibêjin, kuştin, şêlandin û talanên li Swêregê qewimîne ji vê hejmara resmî biiindtir in.
Şerên di nav eşîran de ji bo civata kurd ne tiştekî xerîb e, ev şer her tim hebûne, diziya pez û dewaran jî wisa ye, pez û dewarên gundiyan tên dizîn, yek caran şop li ser dizan û pezan wenda dibe bes gelek caran şopa wan tê dîtin. Camêrek an serokeşîrek dikevin navbera xwediyê mal û dizan û bi babetekî mesele çareser dibe. Bes ev bûyerên li Swêregê çêdibin heta noqteyekê wisa ne, demek şûn da tên guhertin. Gava tu 1978an de li gundên dora Swêregê dinêrî, li her derî reqîn û teqîn heye, eşîret û gundên cîranên hev, bi hev re şer dikin. Cendirme zêde mudaxele nake, Wezîreta Hundir berpirsiyara asayişa hundirîn e, bes ji wir jî zêde deng demakeve.
Kuştina Ferîd qedera Swêregê diguherîne, grûba Ferîd Kawa ye, Kawa li Swêregê grûbek zêde mezin nîn e, hêzên wan, kar û barên wan wek DDKD fire û xurt nîn e. Bes Ferîd mezin e, giraniya wî, qedr û qîmeta wî ya li nava xelkê pir zêde ye. Di wê merhelê de ez bi xwe vê ferq nakim, ez bawer dikim ku gelek hevalên me jî, ji giraniya Ferîd ne haydar in. Bes yên ku gulleyan

66
li Ferîd dibarînin, dizanin, dizanin ku ciyê Ferîd di nava Swêregê de, dervayî Swêregê de bilind e, gulleyên ku li Ferîd bên barandin wê hem qedera Swêregê biguherînin û hem jî li ser qedera welatê me tesîrek mezin çêbikin.
Wisa jî bû, xerîteya Swêregê a siyasî hat guhertin, li wir jî nesekinî, piştî şerê hundir, Swêreg vik û vala bû, mal û malbatên bi sed salan ve li Swêregê jiyabûn, mal û mulkê xwe, rez û erdên xwe, mezelên xwe, dîroka xwe, koka xwe li dû xwe hiştin û barkirin çûn, li welat û bajarên xerîban bûn macîr.
67
22 Çîriya paşîn 1978
Ado, Misto, Reşo, Huso û Brahîm, hevalên Ferîd pir in lê jiyana van pênc kesan û Ferîd pir ketiye nav hev, jiyana wan bi jiyana Ferîd ve bûye yek. Di destpêkê da ji wan kesekî nizane ku rojen pêş da wê çi bê serê wan, hevaltiya wan û Ferîd jiyana wan ji binî diguherîne, 27 sal piştî kuştina Ferîd ev heval hîna jî bi babetekî bi Ferîd re dijîn, dev ji hevdu bemadin, ew di jiyana Ferîd de, Ferîd di jiyana wan de xwe didomîne.
Yê ji wan herî baş nas dikim Brahîm e, ez û Brahîm sê salan bi hev re çûn liseyê, Lîsa Meslekî ya Swêregê, ez beşa Teswiye, ew jî besa înşaatê dixwîne. Di navbera me da hevaltiyek baş û delal ava dibe, di taxima mektebê de em tev futbolê dilîzin. Demek şûn da em tev derbasî Kale Sporê dibin û li wir futbolê dom dikin. Kaptanê me Mustefa ye, bes em ji wî re dibêjin "Qadas",1nsanekî hêja, delal û nefspiçûk e, ji me xortan re dibe rêber, me ji tiştên çewt û xirab diparêze û hemet dike.
Rojekê ji rojan ez û Brahîm diçin serdana Ferîd, ez ji leşkerê

qerdiyan re dibêjim, "Ez ê Ferîd bibînim." Brahîm jî eletexmîn
68
navê camêrekî dibêje. Ez ji Brahim re dibêjim, tu wî camêrî nas nakî, te ji bo çi navê wî got? Brahîm dibêje, navê wî û ê min wek hev e ji ber wê yekê min navê wî got, navekî din nehat bîra min. Ferîd û ew camêr tên ber têla serdanê. Ew li aliyê hundir û em jî li aliyê der, hal û xatirê hev dipirsin.
Hevalê min Brahîm cara pêşîn li wir Ferîd dibîne û nas dike.
Di rojên pêş da Brahîm û Ferîd wê di rexekî de cî bigrin. Ihtimal e ku wê gavê ne Ferîd û ne jî Brahîm tiştekî wisa texmîn nakin, lê beiê qeder wan her duyan fîne ba hev, heta ku roja Ferîd çavên xwe digre, Brahîm her tim li nêzî Ferîd e. Beriya kuştina Ferîd ew li Anqerê mekteba xwe dom dike, her ku fersend çêdibe an hatina wî ya Swêregê hewceyî dike, Brahîm baz dide tê, bi Ferîd re tev kar û barên xwe yên siyasî dimeşînin. Rojên xwe yên teng û giran, rojên bi qehr û qotikan, rojên xwe yên xweşik û dilgeş tev dijîn, canê xwe yên delal û pak, ji talûke, tehdîdan re tev dikin sîper. Di bin tirsa lêdanê de, ji semînerekê, baz didin semînerekê. Qedera wan wek kûregirêkekê dikeve nav hev, di nav vê kûregirêkê de kîjan qedera Ferîd e û kîjan ya Brahîm e kes nizane. Ne tenê qedera wan, dirûvê Brahîm û Ferîd jî bi hev dimînin, rojekê li sûkê xaltiya Brahîm rasfî Ferîd tê, dikeve milê wî dibêje "Brahîmê min tu çawa yî?" Pişfî kuştina Ferîd, Brahîm ji bo semînerekê diçe Sêrtê. Gelek qîmet û rûmet nîşanî Brahîm didin. Çend sal berê Ferîd li wir bi navekî cuda semînerekê dide ji ber wê yekê millet bawer dike ku Brahîm ew meriva ye.
Roja Ferîd tê kuştin Brahîm ne li ba Ferîd e, ew li Anqerê ye, çawa xeber digihîje wir, ew û Ahmedê pismam bi otobusê

dikevin rê, her.du jî xwendevan in, perê wan tune ku bi balafirê biçin, ne ew û ne jî Ahmed nagihîjin ser cenazê Ferîd.
69
22yê Çiriya Paşîn, Ferîd ji xewê radibe.
Havîna dûr û dirêj ciyê xwe hêdî hêdî terk dike payizê, payizek nerm û hênik daketiye ser Swêregê. Pelên daran û mêwên li nav rezan li ber bayê payîzê xwe li ba dikin û ji gulînçekên xwe diweşin erdê, ji aliyê Silimpiyarê û Şîrînqûyê hewt-hewta kûçikan tê. Roj zû ve ye hilatiye, Swêreg hêdî hêdî şiyar dibe. Bê çend kesan wê rojê dê çi were serê Swêregê kes nizane. Ferîd bêhemd di nav ciyê xwe de hilo dibe, Yekbûn xwe davê ser wî û li ser laşê wî xwe hilo dike. Ew dixwaze bavê wê şiyar be û piçekî bi wê re bilîze. Xewa bavo ne giran e, bi salan mekteb xwendiye, mekteba yekemîn, navîn, lîse û dû re jî universîte xwendiye. Ew bi disîplîn e, dikare wexta xwe de ji xewê rabe, bes wê şevê heta saetên dereng kitab xwendiye, zêde xew neketiye çavên wî, ji ber wê yekê laşê wî pêçekî giran e. Yê şeva çûnê herî zêde mijûyê wî mijûl dike, mesela xwarziyê wî ye. Divê biçe ba xwunga xwe, a girîng ev e, xebera ku şeva çûnê gihiştiye wî qet ne baş e, divê wê xeberê bide Paşê an jî bide xwunga xwe ku ew jî ji Paşê re bibêje. Xeber, xebera şer e, ne ya xêrê ye.
Li gor xeberê, Paşa dê bê kuştin. Ji ber vê yekê wê şevê xew neketiye çavên wî, dixwaze piçekî zêde razê, bes Yekbûn nahêle, niha jî porê bavê xwe dikşîne, de were ku razê. Ferîd çavên xwe vedike, bi her du destan Yekbûnê digre û radike hewayê û bi wê re henekan dike û dû re wê li ser lingên xwe dide runişkandin. Bi wê re qelanqîzîk dilîze. Yekbûn ji qelanqîzîkê hez dike, wek meriv li deveyekî siwar bibe, pêş da û paş da diçe û tê. Bavo hewl

dide xwe ku ji nava ciyan rabe ser xwe, Yekbûn dibêje, piçekî din bavo, piçekî din. Ferîd cara dawiyê qîza xwe li ser lingên xwe hêj dike, dû ra wê dike himêza xwe û maç dike. Ya Rebî ez çuqas ji
70
vê keçikê hez dikim, bav û diya wî tên bîra wî, rojên zarotiya wî li ber çavên wî wek xewnek şevan derbas dibe. Beriya ku bibe xwedî zarok^ pir caran nedihat malê, diçû bajarên din û diket civîn û seniîrieran. Ne xebera dakê Kejo û ne jî xebera Apê Sefo çêdibû ku Ferîd li ku ye. Bi şevan xew nediket çavên wan. Gava Ferîd dihat malê tirs û xofa dilê wan sivik dibû. Digot lawo, lawo qet nebe ji me ra bibêje tu diçî ku em zêde netirsin. Wî jî digot de ev çi halê we ye, ez newêrim gavekê bavêm, hûn qiyametê radikin. Telaşa we bîleheq e.
Gava Yekbûnê ji hemêza xwe datîne jêr ev qise tên bîra wî, Xwedê neke tiştek were serê Yekbûnê ez ê çi xweliyê li serê xwe kim? Telaş û tirsa dê û bavê wî tê bîra wî, niha gava zarokê wî heye ew jî wek wan difikire, wek wan hîs dike.
Diçe banyoyê, dest û riyê xwe dişo, bi xawliya kêleka lawaboyê riyê xwe pak dike. Li neynêkê dinêre, şeyê xwe ji dolabê derdixe çend caran porê xwe berbê aliyê rastê ve şe dike, di neynikê de li porê xwe dinêre, di nav porê xwe yê nermik û qemer de têlek spî nabîne. Li simêl û biriyên xwe yên zirav û reş dinêre, bişirînek li ser riyê wî vedide. Bi gavên lez ji wir derdikeve û dikeve mitbaxê, Ruhsar beriya wî şiyar bûye, taştê çê dike. Tayîna wê hîn demektiye, rojên wê li mal û li ba hevalan derbas dibe. Gazincê nake, ji jiyana xwe dilgeş e, piştî salên dûr û dirêj, nîhayet ew û Ferîd ji xwe re wek çûçikan hêlînekê ava kirine, Yekbûna wan jî di bin baskên wan de bi kêf û hezkirin

mezin dibe.
Pişta wê li Ferîd e, Ferîd bêdeng xwe nêzî wê dike, ji para wê dike himêza xwe. Hundirê Ruhsarê diqete, piçek bi henek û piçek bi hêrs dibêje, Ferîd tu çi dikî? Te hundirê min qetand!
71
Ferîd wek zarokan dikene, Ruhsar di nav piyên wî de xwe dizivirîne, hevdu maç dikin.
Ferîd li masa taştê dizivire wek pir caran dixwaze li ser lingan çend parî taştê bixwe, Ruhsar pê de diqehirê dibêje gelo tu nikarî wek însanan li ser sandalyê rûnî û bi me re taştê bikî?
Çavê Ferîd diçe ser penîrê kelandî yê ku Ruhsarê di rûn da sor kiriye, av ji devê wî diçe, ji penîrê sorkirî hez dike. Penîrê kelandî yê Qerecdaxê bi taybetî ji bo Apê Sefo çêdibe û her sal tînin teslîmî Apê Sefo dikin.
Dema Mehemed, Hesen û Ferîd li Anqerê mekteb dixwend, Apê Sefo her tim penîrê wan ê kelandî û suncixên gûza ji wan re dişand. Suncixên ku zêde dima dakê Kejo dikir sandiqa xwe, gava torin diçûn ba wan suncixê xwe derdixistin û bi torinan ve par ve dikir.
Mehemed di salên xwe yên ciwan de wefat kir, Hesen bi xanima xwe li Anqerê ma, niha tenê Ferîd mabû, Apê Sefo penîrê Ferîd ji bîr nekirîbû. Penîrê ku Ruhsarê wê sibê ji bo taştê sor kiribû ew penêr bû.
Ferîd dibêje heyrana te bim, min efû bike, divê ez niha biçim ku bikaribim karê îro piçekî zû xelas bikim. Tu zanî piştî nîvro em ê biçin daweta Reşo, li dawetê em ê li ba hev têr rûnin. Sifetê Ruhsarê ronî dibe, li Ferîd dinêre. Yekbûn tê mutbaxê dibêje dayê ez birçî me, gava çavê Ruhsarê li Yekbûnê dikeve, dilê wê

germ dibe.
Yekbûn baz dide ba bavê xwe, xwe davê himêza Ferîd û bi
lêvên xwe yên çûçik gepên bavê xwe maçî dike.
Ferîd derî vedike, gaveke xwe davêje der û li ciyê xwe disekine.
Xebera ku wê li Paşa bixin ji Ruhsarê re behs nekiriye. Heta wê
72
rojê tiştekî xwe ji Ruhsarê veneşartiye, çi dizî çi eşkere jiyana
xwe bi Ruhsarê re par ve dike. Bes di wê deqîqê de nikare biryarekê
bide. Siyasetê ez û Paşa ji hev dûr xistine, bes Ruhsar ji
Paşa hez dike, niha ez rabim ji wê re bibêjim wê bêhuzûr be,
baştir ku ez behs nekim. Ji hevalên xwe re jî behsa vî tiştî
nekiriye. Çawa bike? Ger rabe ji hevalên xwe re bibêje, îhtimal
heye ku ew çewt bifikirin, bibêjin binêre sêvên darê dikevin bin
darê, Ferîd hîn xwe ji merivatiyê û eşîrtiyê xelas nekiriye. Gelo
Paşa di nava rexê sosyal faşîstan e, em hember wan şer dikin, em
dibêjin şerê azadiya milletê me û şerê li hember sosyal
emparyalîzmê, sosyal faşizmê, ji hev cihê nîn e. Ez heq didim
hevalên xwe, ji ber wê yekê jî ez bi wan re me. Bes Paşa cardin
jî xwarziyê min e, li ber çawê min mezin bûye, ger hinek dikin
wî bikujin divê kêmasî ez Paşê ji meselê haydar bikim.
Ruhsar dibêjê Ferîd xêr e, tu ji bo çi sekinî? Tiştek tune dibêje
û derî hêdîka li dû xwe digre û ji n*-diwanan dadikeve jêr.
Rêya ereban ji ber mala wî derbas dibe, ji aliyê rojhilatê ber bi
Diyarbekîrê û rojhavayê jî ber bi Ruhayê diçe. Mesafeya di
navbera karê Ferîd û mala wî de bi texmînî dora kîlometrekê ye.
Li hember xaniyê wan, xaniyên terzî û karkeran hene. Çend sal
beriya ava bûne. Li dora her xaniyekî baxçeyekî çûçik jî çêkirine.
Yên rewşa wan piçekî baş e, ji xwe ra ketine van xaniyan.

Apartmana ku Ferîd lê dimîne jî nû çêbûye û li ser 5-6 qata ye. Gava meriv ji Swêregê diçe Diyarbekîrê, mala Ferîd li ser piyê rastê, malên terzî û karkeran li ser piyê çepê dimîne. Li aliyê rastê, şantiya Karayollariyê cî digre, mesafeya di navbera şantiyê û mala Ferîd de ji nîv kîlometreyê zêdetir nîn e. Li hember Karayollari Mekteba Yatilî, û li kêleka wê jî meydana fûtbolê heye.

73

Ferîd derdikeve ber apartmanê, li aliyê rastê, ber bi Silimpêyarê mêze dike, dû ra li aliyê çepê dinere û derbasî wî aliyê rê dibe. Rê asfalt e, bes peyarê tune, Ferîd li kêleka rê dimeşe, gava ji ber mala apê Şewket derbas dibe, serê xwe radike û li paca wan mêze dike, kesî nabîne.

Dema Ferîd name ji bavê xwe re dişîne û dibêje ez dixwazim bi Ruhsarê re bizewicim, Apê Sefo qiyametê radike. Yê ku Apê Sefo îqna dike apê Şewket e. Ew li Karayollarî kar dike û di xaniyekî karkeran de dimîne.

Wek her dem Ferîd bi peyatî diçe ciyê karê xwe. Wê rojê jî wisa dike. Van meşên sibê kêfa wî tîne, hem piçek bayê pak digre hem jî, pirsgirêkên di serê xwe da dixe dûzanekê. Wê sibê her çawa dike bi ser nakeve, pirsgirêkên di serê wî de nakevin dûzanê, her yek bi aliyekî ve diçe, lê yê serê wî mijûl dike, Paşa ye. Yên dixwazin wî bikujin, wê çi qezenc bikin? Bo çi dixwazin wisa bikin? Yên biryara*kuştina wî dane kî ne? Yên tetikê bikşînin kî ne? Bersîva van pirsan nabîne, bersîvek maqûl tuneye. Hişê wî diçe, pirsgirêkên di mejiyê wî de dibin wek girêkekî mezin û li ser sînga wî rûdinin, bîhna wî teng dibe. Serê xwe radike, dinêre gihîştiye karê xwe, beriya ku têkeve hundir li ser milê xwe yê çepê dizivire, li xaniyê Kultur Sevenlerê dinêre.

Dibe ku Paşa niha li wir e, bes ez nikanim biçim wir, li ber çavên xelkê, ez ê çawa biçim dergaha sosyal faşîstan, serekê Kawa dê çawa biçe nava dijminan, em ê çi bersîvê bidin xelkê? Qethîne nabe, baştir e ez biçim ba xwunga xwe, ji wê re bibêjim, bira ew jî Paşa haydar bike, herî maqûl wisa ye. Ferîd dikeve hundir. Gava Ferîd li xaniyê Kultur Sevenlerê dinêre, Paşa, yanî ez, li hundir runiştî me. Gava Ferîd raza ye, ez şiyar im, wê şevê ez û

74

çend heval em raneketine, çipkek xew neketiye çavên me. Li kuça hember Kultur Sevenlerê maleke hevalê me heye, wê şevê em li wir dimînin. Sibê zû em tên komela xwe vedikin, sobê vêdixin û li dora sobê rûdinin. Em wek xeyaleta ne, deng ji me demakeve, min çavên xwe li agirê nav sobê bel kiriye. Hevalek radibe çay dem dike. Gava germiya sobê gur dibe, em li ser sandalyên xwe sist dibin. Du xort dikevin hundir, salên wan ger ez şaş nebim li dora bîstî ne. Li serê yekî şewqê Swêregê heye, biriyên wî qalind, reş û eniya wî fire ye. Simêla xwe bi meqesê qusandiye, şelwar, çakêt û solên meqab lê ye. Renga wî esmer e. Ne kin ne dirêj e, bejna wî normal e. Hinek însan hene, dema meriv carê dibîne ne mumkun e ji bîr bike, ev lawik jî wisa bû. Yê din nayê bîra min, şeklê wî zêde ne balkêş bû. Bes bi Swêregiya namînin, xerîb in, silavê didin, em silavên wan digrin û li dora sobê ji wan re cî çêdikin. Rûdinin, em carekî din merheba didin û ji wê pê da ne ji me û ne jî ji wan deng derdikeve. Tu dibêjî qey li ser me heriya mirinê reşandine. Ji pacê li der dinêrim, tîrêjên tavê xwe li dîwarê baxçê xistine. Radibim diçim der, pişta xwe didim dîwarê baxçê, berê min li derî ye. Li ser min çakêt heye, destên min li ser sînga min in, min her du destên

xwe li ser sînga xwe li hev girêdane. Bîskeke din ev du kes ji hundir derdikevin, yê şewqe li sêrî li pêş, ê din li paş e. Ez û yê li pêş li hev dinêrin, bê hemdê xwe ez destê xwe yê rastê hêdî hêdî dixim bin paşila xwe ya çepê, wek ez dixwazim ew fam bike ku ez destê xwe davêm demança xwe, bes li ser min demançe tune. Camêrê pêşî tiştekî nake, ber bê deriyê baxçe dimeşe û li min dinêre. Heta niha jî min fam nekiriye ku min çima wisa kir.

75

Yê ku piştî nîvro gulleyan li Ferîd dibarîne ji wan her du kesan ê bi şewqe ye. Ez niha bê guman dikarim bibêjim ku, ew ji bo lêxistina min hatibûn komelê. Ihtimal e ku gava min destê xwe avêt paşila xwe, wan fam kir ku ez bi tedbîr im, çend hevalên min jî li hundur rûniştibûn. Nehat hesabê wan, ji min wazgêç bûn.

Bûyerek balkêş jî li Anqerê çêdibe. Çend roj beriya kuştina Ferîd, du kesên nenas nîvê şevê diçin ber deriyê mala diya Ruhsarê û dixwazin têkevin hundir. Bes Ferîd li wir nîn e, li Swêregê ye, yê li wir dimîne hevalê Ferîd ê herî baş e, Brahîm û xanima wî ji bo demekê kurt li wir dijîn.

Ev du kes dixwazin bi destê zorê têkevin hundir, wê gavê Brahîm dibêje, destê min de demançe heye, ger hûn têkevin hundir ez ê bera we dim. Ew zilam vedigerin. Qenaete Brahîm ew e ku ew du kes ji bo kuştinê hatibûn.

Yên wê sibê dixwazin li min xin û yê wê rojê piştî nîvro li Ferîd dixin ne ji Swêregê ne. Ji ciyekî an ji bajarekî dinê hatine Swêregê, Swêregê baş nas nakin. Hinek kes divê ji wan re yataxî bikin, kuçên Swêregê, qereqolên polîsan, mala Ferîd, mala min,

ciyê karê Ferîd, ciyê komala me û komela Ferîd, riya mala min û Ferîd, qahwexanên em diçin, nîşanî wan bidin.
Biserketina vê planê girêdayî ye ku mêrkuj neyên naskirin û neyên girtin. Gava mêrkuj bête naskirin, plan ê têk biçe. Ew, beriya ku gulleyan bibarînin divê deh cara bifikirin ku ew ê ji sedî sed bi silametî ji ciyê bûyerê bikaribin dûr bikevin.
Bêyî van her du mêrkujan hinek însanên din di nav vê planê de ciyê xwe girtine, pêwestiyên xwe gor planê tînin cîh. Beriya kuştina Ferîd û dû kuştina Ferîd rêberiya xwe pêşkêş dikin.
76
mêrkujan li malên xwe dihewînin, nan û ava wan didin ber wan, nivînên nermik û germik ji wan re radixînin, bi hevdu re suhbet û henekan dikin û cixaran dikşînin. U piştî 27 salan hîna jî ji devê xwe tiştek nerevandine, ne xwe û ne jî mêrkuj eşkere nekirine.
Netîceya ku derdikeve pêş me ev e, ku derveyî van her du mêrkujan hinek kesên din, dizanîbûn ku Ferîdê dê wê rojê bê kuştin.
Pirsgirêka ku ez jê re bersîvê nabînim ev e: Kî ji Ferîd re dibêje, wê Paşa bikujin? Yê vê informasyonê dide Ferîd kî ye? Û ji bo çi vê informasyonê dide Ferîd?
Li Swêregê yên ez nas nedikirim tunebûn, çima ji merivekî, hevalekî min re nabêje û diçe ji Ferîd re dibêje?
Gava Ferîd bi min re mijûl dibe, haya wî tuneye ku gav bi gav, deqîqe bi deqîqe ber bi mirina xwe ve dimeşe.
Camêrê ku gulle li Ferîd dibarîne, tetikçî ye, yanî di destê hinekan da maşe ye. Ferîd nas nake, gava Ferîd nas bike, gava bizanibe ku Ferîd çi însanekî delal û welatperwer e, dibe ku tatbîqkirina

emrê kuştinê qebûl neke. Wisa nabe, bê wîjdan û bi
çavsorî gulleyên xwe li ser Ferîd direşîne.
Ger ev tetikçî ye, gelo yên li pişt wî kî ne? Biryara kuştina
Ferîd ji bo çi girtine? Di girtina vê biryarê de ji wan kîjanî rola
herî girîng lîstiye? Û ji bo çi dixwazin Ferîd bikujin?
Ferîd ronekbîrê kurda ye, Ferîd dengbêjê milletekî bindest e,
Ferîd helbestvan û kurteçîrokvanê edebiyata kurd e, Ferîd welatperwer
û şoreşgerê welatekî mazliim e. Ferîd li kesî neheqî
nekiriye, di dolab û firildaqa de tiliya Ferîd tuneye. Xirabiya
kesekî naxwaze, mezelê kesî nakole. Mumkun e ku hinek axa û
77
beg hatine daîra Ferîd û xwestine, ji heqê xwe zêdetir gubre
bigrin, mumkun e ku Ferîd gotiye ez nikarim wisa bikim, heqê
te çî ye ez ê heqê te bidim. Cardin mumkin e ku ev axa yan jî beg
ji Ferîd hêrs bûye, dibe ku di nava wan da munaqeşeyek jî
çêbûbe. Bes axa û began bi hezar salan e ku xelk kuştine an jî
dane kuştin, di civata kurda de meriv kuştin kar û barê rojane ye.
Bes mêrkujên di nava vê çarçovê de çêdibin, demeke dûr û dirêj
nayên veşartin, ne mumkin e ku bên veşartin. Rojekê, li
civatekê, li malekê ev eşkere dibe. Hinek ji devê xwe derdixin,
kî mêrkuj e eşkere dike. Ji kuştina Ferîd heta îro 27 sal derbas
bûne, heta niha tu tiştek eşkere nebûye, tu tiştek demeketiye
meydanê ku axa û began nîşan dide.
Li Amerîkayê John F. Kennedy, li Swêde Olof Palme û li
Turkiyê bi sedan însan hatine kuştin, ger em istîsnayan ji nav
derxin, yên di biryardayina van kuştinan da cî girtine zû bi zû
eşkere nabin. Tetîkçî tên girtin yan jî eşkere dibin, bes yên biryar
dane, yên demançe xistine destê tetikçiyan û ji wan re gotiye

biçin filan kesî bikujin, bi hêsanî eşkere nabin, her çuqas wext derbas dibe ewqas jî av li ser wan zelal dibe.
Yê bixwaze însanekî wek Ferîd bide kuştin, kî ye an kî ne?
Ez nikarim ji sedî sed bibêjim kî ne, bes min tetikçiyê ku
22yê Çiriya Paşîn de gulle li Ferîd barand, bi çavên xwe ew dît, em li hember hev rûniştin, me li nav çavên hevdu nêrî, û ji ber min derbas bû û çû. Yên demançe dabûn destê van hîna jî ne belî ne, lê belê tiştek belî ye. Ev jî ew e ku ev kes dostên, hevalên û dilşewîtiyên milletê kurd nîn in. Ji ber vê yekê bi rehetî biryara kuştina Ferîd didin, tetbîq dikin û dikarin heta îro roj xwe veşêrin.
78
Nîvro nebûye, Ferîd li ciyê karê xwe hinek ewraqan îmza dike, ji hinek ciyan re telefonê dike, çend heb gundî li derveyî oda wî mniştine, dipên ku doba wan bê. Ji bo gubre wê muracaatê bikin. Ferîd destê xwe lez digre, divê beriya nîvro xwe bigîhîne xwunga xwe.
Pîrekekî ji cîranên Ferîd, cilên mala xwe dişo, derdixe balqonê ku dar dake, li wir zû zuha dibin. Di aliyekê de cilan bi darde dike û ji aliyên din jî li der û dora xwe dinêre. Çavên wê li ser du kesan disekine, di hafizeya xwe de digere, resmên însanên ku nas dike tîne ber çavê xwe, bes van du kesan nas nake. Bi xerîba dimînin, li dora apartmanê wek înasanên ku nizanibin wê çibikin doş dibin. Jinik dikeve şikê, ban lawê xwe dike, navê lawê wê ez Ahmed lêdikim, Ahmed sempatîzanê me ye, birayê Ahmed li eczexana Mahmûd Siyaxan kar dike. Wê gavê eczexana Mahmûd li meydana Qaniqûyê ye. Diya wî van du camêrana nîşanî Ahmed dike, dibêje lawê min ev du kes li

dora apartmana me doş dibin, ez wan nas nakim, ev çi kes in? Ahmed jî li wan dinêre, serê yekî de şewqa Swêregiya heye. Diya wî dibêje were em ji polîs re telefonê bikin. Ahmed dibêje divê em piçek sebir bikin û baş fam bikin ku ev çi kes in. Ji polis re telefon nakin.

Beriya ku Ferîd bê kuştin diya Ahmed dibêje lawê min ka rabe, ji me ra nan bikire. Ahmet radibe dikeve rê, firûna herî nêzîk li hember mekteba navîn e, li kêleka yazixana Mahmûd Tektek e. Ji apartmana Ahmed ku Ferîd jî li wê apartmanê dimîne, heta firûnê bi peyatî qasî 15 deqîqe wext digre, çûyîn û hatin dora nîv saet digre. Ahmet diçe firiinê nan dikire û vedigere malê. Gava nêzîkayî li malê dike, ji dûr ve dibîne ku tiştek

79

bûye, dengên hawaran digîhîje Ahmed. Gava tê ber apartmanê êdî meselê fam dike. Ferîd kuştine. Ahmet nanê xwe dide diya xwe û rasterast tê komela me.

Em vegerin daîra Ferîd. Gundiyên ji bo muracata gubrê dipên radibin ser piyan, niha doba wan e, şewqên xwe ji serê xwe datînin, deriyê oda Ferîd vedikin û dikevin hundir. Ferîd radibe ser piyan, ji paş masa xwe tê pêş masê, destê xwe dirêjî wan dike, yekayek destên her sê gundiyan digre û ji wan re dibêje hûn bi xêr hatin. Ew jî dibêjin tu nav xêrê de bî. Piçek li hev şaş dibin. Rastî muhendîsekî wisa qet nehatine, li daîra dewletê muameleyek wisa ji wan re xerîb tê. Rûnin an li ser piya bisekinin nikarin biryarê bidin. Herwiha Ferîd wan keremî rûnişkandinê dike û bi xwe jî rûdine, hal û xatirê wan dipirse. Dibêje afû bikin, ez ê li ser erzûhala we di demeke kurt de biryarê bidim, bes divê ez niha biçim. Gundî jê re spasiyên xwe

dikin, xatir jê dixwazin û diçin. Li pê wan Ferîd derdikeve der, berê xwe dide mala xwunga xwe.
Ereba resmî heye, lê Ferîd dixwaze bimeşe, bimeşe û bifikirê.
Li rojhilatê ciyê karê wî de şûbeya Eskeriyê û qereqola cendirmeyan heye. Dibistana sereta Devrim îlkokulu li paş daîra ziraetê ye, pêş dibistanê kuçeyaa Hurriyet û li aliyê din nexweşxana Swêregê heye. Di navbera ciyê Ferîd û nexweşxanê de dibistan û kuça Hurriyetê hene. Piştî gullebarandinê wê Ferîd bînin vê nexweşxanê.
Wisa xuya dike ku mêrkujên Ferîd ji berê de biryar dane ku wê yan li ber mala Ferîd yan jî li nêzîkî mala Ferîd, li Ferîd xin. Ciyê karê Ferîd ne musaid e. Bê guman dikarin li wir jî li Ferîd xin, bes îhtimala ku bên dîtin mezin e, muheqeq gelek însan wê
80
wan bibînin û cardin îhtimaleke mezin heye ku hinek însan bi dû wan kevin.
Navbera komela me û ciyê karê Ferîd li dora 200 metre ye, Lîse li paş komela me ye, cardin Mekteba Navîn (Ortaokul) li ser kuça Hurriyetê ye, 200 metre wir da ye. Paş nexweşxanê Lîseya Meslekê heye, pîraniya xwendevanên wir hevalên me ne. Xwendevanên van mekteban şoreşger in, pêşverû ne, gava dengê teqînê biçe wan wê dersên xwe berdin û bazdin ciyê ku deng jê tê. Endam û sempatîzanên komela me wan rojan li ser êstiriya rûdinin, di navbera Halk-Derê û hevalên me de şer derketiye, ji ber wê yekê her kesî guhên xwe bel kirine. Bi dengê teqînekê wê bazdin ciyê bûyerê. Herwiha ciyê karê Ferîd ji bo mêrkujan ne ciyekî musaîd e. Ciyê mala Ferîd musaid e, mala Ferîd li ciyekî wisa ye ku li wir zêde însan tune, yên hene cîranê apartmanê û

neferên xaniyên terzî û karkeran e. însanên ku li dû mêrkujan bazdin nîn e. Qereqolên polîsan di nava bajêr de ne, heta yek telefon bike, heta polîs li ereban siwar be û bê wir, kêmtir ewê nîv saet derbas be, heta wî çaxê mêrkuj xwe digîhînin Esmerçayirê. Ferîd derdikeve ser kuça Hurriyetê, derbasî ser peyarêya li aliyê rastê dibe. Li baxçê Mekteba Navîn dinêre, zarok derketine tenefusê û ji xwe ra dilîzin. Dema xwe tîne bîra xwe, li wê mektebê sê salê wî derbas bûbû. Mudurê wan Şewketê Ruhayî bû, hundirê zarokan ji Şewket diqetiya. Mekteb û xwendevan jiyana wî bû. Bi roj ne bes, bi şev jî çoyê xwe dikir destê xwe qahwe bi qahwe digeriya. Gava rastî xwendevanekî bihata, bi lêdanê ew dişand malê.

Kesî nedixwest li kuçeyekê teng rastî Şewket were. Rojekê ez û Ferîd ji ber mektebê derbas dibin, wê gavê ez diçim dibistana

81

seretayî, mudurê xalo nas nakim, ez nizanim ew çi zebanî ye, carekê de Ferîd destê min girt û me her duyan wek kurgiyan xwe avêt paş dîwarê mektebê. Ferîd ji min re dibêje dengê xwe meke, heta mudurê min derbas dibe. Bes ez dixwazim mudurê wî nas bikim. Ez serê xwe piçekî bilind dikim û li mudur temaşe dikim, li belê newerêm nefesê bigrim. Şewket derbas dibe şûn da ez û Ferîd têr dikenin. Bi zar û zor em xwe ji lepên Şewket xelas dikin.

Ferîd digihîje qehwa Zifqar, berê, qehwa Zifqar li derveyê bajêr, di navbera petrola Ozurekya û sîloyên Ofîsê de bû. Wê demê qehwa Zifqar di navbera nivşên kevn û nû de dibe ciyekî girîng. Xwendevanên Swêregê yên li Stenbol û li Anqerê mektebê dixwînin, tatîla havînan da tên Swêregê û li wê qehwê bi

xortên pêşverû re rûdinin û sohbet dikin. Qet ji bîra nakim havînekê ber bi êvarê em rûniitine, Mahmûdê Kaloyê Aresî ji Stenbolê hatiye. Mahmûd pakêta xwe ya malboro derxist, cixare îkramî me hevalan kir. Ez çewt nebim Deza Sefer cixara Mahmûd girt, fîlîtreya cixarê jêkir û cixara xwe vêxist. Mahmûd eciz bû, got cixara bê fîlître ji cixara bi fîlître xirabtir e, gava imkanên meriva hebe meriv cixarê bê fîlître nakşîne. Û gava em sosyalizmê dixwazin ev jî tê wê maneye ku em jiyaneke xweş û bi qelîte armanc dikin.

Zifqar li ser kuça Hurriyetê qahwexaneyek vekiribû, ew jî ketibû ber bayê siyasetê, ez bawer dikim xwe wek sempatîzanê maoîstan dihesiband. Du roj beriya kuştina Ferîd, hevalên Halk-Derê yên ku bi hevalên me re lec dikin li qehwa wî runiştine. Dema hevalên me ji wir derbas dibin qisan davên hev û şer dest pê dike. Remezan dimire û Zafer birîndar dibe.

82

Ferîd ji ber qehwa Zifkar dizîvire piyê rastê û dikeve kuça paş, ji wê kuçê meriv digihîje Kuça Seytana. Di van kuçana da Ferîd bi salan çûye û hatiye.

Ji mekteba navîn heta ku dibe muhendîsê ziraetê doraliya 15 sal wext derbas dibe, bes dikanên û dikançiyên li ser rêya Kuça Şeytana nehatine guhertin, dikana Qaqoyê Serabê hîn li ciyê xwe ye, niha pir caran xwarziyê Qaqo Osman li wir rûdine, dikana xalê Zulkîfê qundirecî li kêleka Qaqo ye, paşiya xaniyê Zilkif û xalo bi hev ve ye.

Ferîd beriya nîvroyê, bê ku bizanibê ew cara dawiyê ye li kuçên Swêrega xwe dimeşe, ji ber dikana bavê xwe ya kevn derbas dibe, çavekî davê dikanê, rojên wî yên zarotiyê tên bîra wî.

Refên li ber sê dîwaran ji erdê heta asraxan bi cil û cawan tije bû. Dikan tu cara vala nedima, ji sibê heta êvarê yek dihat yek diçû. Dema du-sê kes tev dihatin li dikanê ciyên rûnişkandinê nedima. Şagirdên qehwa Hec Ûsub li pê hev ji mêvan û muşteriyan re çay danî. Yên ji apê Sefo caw dikirîn tu cara perê pêşin nedidan. Apê Sefo jî wek her carî deftera xwe ya deynan derdixist û deynên muşteriyan li wê defterê bi tarix û nav dinivîsand. Rojên Apê Sefo li dikanê derbas dibûn, li wir tenê caw nedifrot, pez dikirî, pez difrot, bi kirîbê xwe yê Aloyê Qerecdaxê re şirîkatiya xwe pêş dixist. Bes perekî zêde ji dikanê qezenc nedikir. Perê ku diket destê wî ji xwarina xwe û zarokên xwe re serf dikir. Gelek muşteriyan perê wî nedida û ew jî zêde bi dû perê xwe nediket. Kêfa Ferîd ji dikanê re dihat, gava dihat dikanê ji xwe re temeşayî însanan dikir, kuçên bajêr ji bo wî wek sînemayê bûn. Dema bîhna wî teng bibûya, diçû ba birayê xwe yê mezin. Xalo Evdo birayê wan ê mezin bû, neçûbû mekteb û medresê, ji xwe

83

ra bûbû terzî, dikana wî di nav çarsiya solan da û ji dikana Apê Sefo qasî sê deqîqan dûr bû. Xalo Evdo jî wek Apê Sefo şewqê xwe li serê xwe xwar dikir, ji aliyekî bi meqesê caw dibirî û ji aliyê dinê kilamên kurdî ji xwe re digot. Wî jî wek Apê Sefo pereyekî zêde qezenc nedikir, bê xwarin û vexarinê qezencek wî çênedibû. Dikana bavê Ferîd û dikana birayê wî zarotiya Ferîd neqişandin, bes ew nebû terzî û ne jî bû manîfatûracî. Qederê rêyek dinê dabû ber wî û ew di wê rêyê da dimeşiya.

Ji aliyê bajêr, li dawiya kuça Qeleboxaziyê, li ser piyê çepê qahwexana Emerê Sing hebû. Berê ciyê qahwexanê xana Bûbê bû, xalê Bûbê Ermenî bû, li xana xwe hesp û ker nal dikir û yek

caran jî keran dixesand. Dû re mala xwe bir Stenbolê. Ferîd vê qahwê derbas dike, di nava Camiya Emer Axa re derbas dibe, gava digîhîje ber deriyê Eshet Odabaşî, bavê Ahmedê pismam, zarotiya Paşa û Saqip tê ber çavên wî. Rojekê xwe avêtibû ser pisqilêta Paşa û heta vir, heta ber deriyê apê Eshet ajotibû. Paşa û Saqip jî bi kêf û henek li dû wî baz dabûn. Cardin rojekê li hewşa apê Qado dilîstin, Paşa ji wî aliyê dîwar kevirekî çûk avêtibû û serê wî şikandibû. Rojên wan ê herî xweş û azad li nav rezê bavê wî derbas dibûn. Gava tirî çêdibû, Apê Sefo li kera xwe siwar dibû, Ferîd û xwarziyên wî jî diketin dû Apê Sefo û diçûn nav rez. Di nav mêwan da bera hev didan, bi hev re gulaş dikirin. Apê Sefo tiştek nedigot, kêr di destan de, fitika xwe lê dixist û gûşiyên herî xweşik jê dikir û dixist nav selikê.
Ev bîranînên zarotiyê dilê Ferîd sivik dike. Ji xwe re dibêje, belê em di warê siyasî de dujminên hev in, gor nihêrtinên me, gor bîr û baweriyên me divê ez vê xeberê negihînim wî. Bes ez ê çawa vê xeberê nedim wî? Gava tiştek bibe wê xwunga min ji
84
min re nebêje "Ferîd, te çima xeber neda me? Te çima em haydar nekirin?" Wê gavê ez ê ji xwunga xwe re çi bibêjim? Ez ê çi xweliyê li serê xwe kim?
Li Wêranşarê gava min êrişî Paşa kir, ma wî jî ji min re negot meyê ser min, tu xalê min î, ez naxwazim li te xim. U ev gotinan di huzûra hemû hevalên xwe de kiribû. Niha jî ez wisa dikim, gava hevalên min pê bihese ku min xeberek wisa dayê Paşê, wê xezebê li min bibarînin, min bi nedumstiyê îtham bikin, qîmet û rûmeta nîşanî min didin ewê paş da bigrin. Di warê siyasî de ez xwe bavêjim kîjan alî, ez ê nikaribim ji vê rewşa xwe ra îzehetekê

bibînim lê di warê mirovatî de ez nikarim bêdeng bimînim, gava çi heval, çi mirovê meriv di bin talûkeyekê de be, bêdengmayin ne rast e, em hemû zarokên vî welatî ne, rîçên me, diroka me yek e. Di bingehê xwe da xebata me jî yek e. Em hemû çi dixwazin? Jiyanek bê zulum û zordarî, jiyanek serfîraz, azad, ne kêm û ne jî zêde. Herwiha ez di wê qeneatê da me ku ez tiştekî xirab jî nakim. Gava rojekê hevalê min bi vê bûyerê bihesin hêviya min ew e ku wê fam bikin.

Di nav van xeyelan da Ferîd digihîje mala me, ji deriyê hewşê dikeve hundir, diya min li hewşê ye, hewşê dimale. Ferîd dibêje:

- Hekê tu çi dikî?
- Ferîd! Xêr e, tu çi digerî?
- Wele hekê min xeber girtiye ku wê li Paşê xin.

Wê şevê ez neçûme mal, diya min nizane ez li ku me û bi çi mijûl dibim, xew neketiye çavên wê, bê xew û bê huzûr e, qisên xalo Ferîd dilê diya min diqetîne, heş li serê wê namîne. Bi Ferîd re hêrs dibe, jêra qisa dike. Ferîd dixwaze wê sakîn bike, dibêje, qiyametê rameke, min xeber girtiye ciyê Paşê baş e, metirse.

85

Diya min sakîn nabe, Ferîd divê biçe kar, diya min sola xwe dixe lingên xwe, çarşeva xwe dikşîne serê xwe û bi dû Ferîd dikeve. Gava digîhjin ber firûna Hec Ebbas, Ferîd dibêje ez birçî me, radibe pariyek nan ji fimnê dikire, perçeyekî dide diya min û perçeyek jî bi xwe dixwe û dimeşin. Xalo bi rê ve diya min sakîn dike, li ber mala xalê Miçoyê Ebasan diya min vedigere mal. Diya min cara dawiyê birayê xwe dibîne, haya wê tune ku ber bi êvarê Ferîd wê were kuştin.

22 Çiriya Paşîn, Misto ji gundê xwe bi rê dikeve.

Pişfî sala 74an li Anqerê DDKD ava dibe, Misto di nava DDKDê de akfîf dixebite, di kar û barê belavok belakirinê da, civîn û mitînga da Misto her dem li pêş e. Ne tirs û ne jî mirinê nas dike. Wê demê di nav Anqerê de belavok belavkirin, mitîng çêkirin karê her camêrî nîn e, ulkucî wek gurên har û birçî li dû şoreşgeran digerin, rojê carekê li pêşverûyan gulle dibarînin, ji çend rojan carê li ser riyên mekteban xwendevanek tê kuştin.

Misto ji gundekî Hîlwanê ye, hevaltiya wî û Ferîd heta deqîqa Ferîd tê kuştin dom dike. Roja ku li Ferîd gulle tên barandin Misto jî li ba Ferîd e, ew li aliyê çepê erebê dibe şahidê gullebarandina ser Ferîd.

Wê sibehê gava li gund ji nav ciyê xwe radibe, ew nizane ku dê çi bê serê wî.

Hîlwan di navbera Swêregê û Ruhayê de ye, riya Ruhayê di nav Hîlwanê re derbas dibe. Riya asfalt bajêr dike du perçe, her perçek dikeve aliyekî. Xaniyên Hîlwanê ji heriyê çêbûne. Van salên dawiyê xaniyên beton jî roj bi rojê zêde dibin. Xelkê

86

Hîlwanê û gundên li dora Hîlwanê, xwe ne ji Swêregê û ne jî ji Ruhayê dihesibînin, li belê tesîra Swêregê û Ruhayê her dem li ser Hîlwanê hebûye. Qedera Hîlwanê bi babetekî bi Swêregê ve hatiye girêdan. Di warê civakî û siyasî de têkîliyên navbera Hîlwan û Swêregê de gelek bi hêz e. Nivşên şoreşger vê têkiliyê piçekî din jî xurt dikin.

Misto ji xewê radibe, taştêya xwe dixwe û derdikeve hewşê, kursiyekê dikşîne bin xwe, berê xwe dide tavê û rûdine. Neferên malê li ser piyan e, lê belê kes Misto narehet nake, ew dizanin

ku heta Misto cixara xwe ya sibê nekşîne heş nayê serê wî. Cixara xwe kişand şûn da meriv dikare bi wî re qise bike. Zarotiya Misto di nava gund de derbas dibe, sînorên dinyaya wî li dawiya erdên gundê wan xelas dibe. Roja ku ji bo xwendinê ji gund derdikeve, dinyaya wî fire dibe, sînor ji ber wî radibin. Li Anqerê ji her bajarên welatê me însanan nas dike, bi wan re dibe heval, bi wan ra bajar bi bajar digere. Yên di wê demê de di nav DDKDê de kar dikin, di pêşerojê de dibin serokên gmbên çep û welatperwer. Misto hemûyan nas dike, bi hemûyan ra radibe û rûdine, lê herî dawiyê qedera xwe û Ferîd di karê siyasî de dike yek. Di vê yekbûnê de çiqas dîtinên siyasî û çiqas şexsiyeta Ferîd rolê dilîze tenê Misto bi xwe dizane.

Misto cixara xwe vêdixe, çend nefesan li ser hev dikşîne, duxana ji pozê wî derdikeve, li hewa piçek doş dibe û dû re dikeve ber bayê û winda dibe. Bi bayê ve dengê erebên diçin Ruhayê û Swêregê heta ber malê tê. Çûçikek tê li ser dara di nav hewşê de vedinişe, li ser gulînçekên darê zêde pel nemane, Misto serê xwe radike li çûçikê dinêre, duxana cixara xwe ber bi çûçikê puf dike, çûçik difire û diçe rêya xwe.

87

Jiyana wî jî kêm zêde wek çûçikê ye, di nav van sê-çar salan da ji serîkî welat heta serîkî din wek çûçikê doş dibin, yek caran bi Ferîd re, yekcaran jî bê Ferîd diçin bajaran, gundan, însanan nas dikin, hevalên nû ji xwe ra çêdikin.

Reşo û Misto wek brayên cêwî ne, li Anqerê her tim bi hev ra ne. Gava Misto û Ferîd di nav Kawayê de cî digrin, Reşo jî li ba Misto ye. Wê rojê daweta Reşo û Nedretê dê li Diyarbekîrê çêbe, daweta zewacê nîn e, ew ê dergîsfî bin. Ji ber wê yekê Misto dê

biçe Diyarbekîrê.
Misto ji ser kursiya xwe radibe, ji diya xwe û neferên malê xatirê xwe dixwaze. Ji diya xwe ra dibêje ez ê derkevim ser rê û biçim Swêregê û ji wir jî bi dolmişekê biçim Diyarbekîrê.
Xebera diya wî heye ku nîşana Reşo ye, dibêje bi silametî biçe lawê min. Misto derdikeve ser rê, li dolmişekê destê xwe bilind dike, dolmîş disekine, Misto dikeve nav dolmîşê û li kêleka şofêr ciyê xwe digre. Dolmîş hedî hedî ji ciyê xwe radibe, li dû xwe bîhna mazotê û duxaneke reş berdide û ji ber çavan wenda dibe.
22 Çiriya Paşîn, Ado û Huso ji Diyarbekîrê bi rê dikevin...
Ado û Huso bi salan berê de hevalên hev in, gava hevaltiya wan dest pê dike, bi siyasetê ve mijûl nabin. Di Lîseya Swêregê de xwendevan in. Bavê Huso ji bajarê Erûhê ye û li wir di tekelê de kar dike. însanek bi namûs û şeref e, ji milletê xwe, ji xelkê xwe hez dike, welatperwer e. Hukmat wî surgûnê Swêregê dike. Huso li Swêregê dest bi lîseyê dike û bi Ado re dibe heval û hogir. Gava derbasî sinifa sisêyan dibin, cardin bavê Huso surgûnî bajarekî dora Afyonê dibe. Hevaltiya Ado û Huso jî herwiha qut dibe. Huso li bajarekî xerîb sinifa sisêyan dixwîne, bes ji mehekî
88
zêdetir namîne. Piştî mehekê cil û cawê xwe berev dike û bi destûra bavê xwe dikeve ser riya Swêregê. Wê gavê Ado bi merivên xwe re li xaniyekî nêzî dibistana yekemîn Gazî Paşayê dimîne. Dibêje, me nihêrt şevekê deriyê me lê ket, me derî vekir ku çi bibînin, Husoyê me li ber derî sekiniye. Huso dibêje, "Ez vegeriyam, ez ê bi we ra liseyê xelas bikim." Wisa jî dikin, her du tev lîseyê xelas dikin û her du tev dikevin imtihana universîteyê. Ado li Anqerê dikeve tibê, Huso bi ser nakeve, li Anqerê

dest bi dersxanê dike. Sala duduyan ew jî dikeve tibê. Salek şûn da ew û Ado neqla xwe radikin Diyarbekîrê, li Diyarbekîrê li Baxlera bi hevalekî memûr re di xaniyekî de dimînin. Pir naçe hindik naçe Ado dizewice, ew û xanima xwe ji xwe re daîreyekê li mehela Şhîtlixê kirê dikin. Huso jî li Ofîsê daîreyekê kirê dike. Şeva 22ê Çiriya Paşîn, di saetek dereng de hinek li cama paca mala Ado dixin, Ado diçe pacê, zilamek dibêje ez cîranê te me, jana jinikeke hemîle rabûye, ka were kerema xwe re em bi ereba te wê bibin nexweşxanê. Ado wek her dem bi tedbîr e, di nav ereba xwe da ji bo demançê ciyek çêkiriye, demança xwe li wir vedişêre. Ji zilam re dibêje hûn biçin serê koşê û li benda min bin, ez ê cilê xwe li xwe kim û bêm. Ji ber ku Ado bi guman e, nas nake ku ew zilam çi kes e, ji ber wê yekê beriya ku biçe ba zilam, dixwaze demança wî li ber destê wî be.
Elelecele cilên xwe li xwe dike, ji xanima xwe xatir dixwaze û dadikevê jêr. Deriyê ereba xwe vedike, li paş dîreksiyonê cî dide xwe, demança xwe ji ciyê dizî derdixe û dixe ber pişta xwe. Li serê koşê, zilamê ku li paca wan xistibû û jinikek hemîle li benda wî ne. Gumanên Ado winda dibe, zilam û jinikê bi silametî digijîne nexweşxanê, ji çend doxtorên nas rica dike ku ji jinika reben re alîkar bin.
89
Ado nîvê şevê vedigere mal, demançe li pişta wî derdikeve daîra xwe, demançê dike bin balîfa xwe û radizê.
Sibê ew û xanimê wê biçin Ferîd, Ruhsar û Yekbûnê ji Swêregê bi ereba xwe bigrin û bînin Diyarbekîrê. Ew jî wek Misto wê biçin daweta Reşo. Ferîd çend roj beriya ji Ado re dibêje hatina te hewce nake, em li dolmîşekê siwar dibin û tên,

bes Ado israr dike, dibêje, em ê werin we bigrin. Êdî Ferîd dibêje baş e, ez ê li benda we bim.
Wê rojê, Ado sibê zû ji xewê radibe, taştêya xwe dixwe û diçe sûkê, demekê li nav sûkê dizivire û dii re diçe mektebê, li wir rastî Huso tê. Ado ji wî re dibêje, ez ê nîvrokî biçim Swêregê û Ferîd bînim. Wê gavê Huso dibêje ez jî bi te re têm.
Beriya saet donzdah diçin mala Ado, Ado ji xanima xwe re dibêje planê me hat guhertin, Huso dixwaze bi min re were, ger tu eciz nabî ez û Huso em ê biçin Swêregê. Xanim dibêje tiştek nabe, bi silametî biçin, oxira we ya xêrê be.
Dora saet donzdeyê nîvro Ado û Huso ji Diyarbekîrê derdikevin. Qasî bîst kîlometreyî ji Diyarbekîrê dûr ketine, Ado ji carekê de ferq dike ku demança xwe li bin balîfê xwe ji bîra kiriye. Dibêje, Huso min demança xwe li mal ji bîra kiriye. Huso dibêje, de tişt nabe, em naçin şer, em ê Ferîd bigrin û vegerin.
Ado paş da venagere lê dilê wî jî tam rehet nîn e, her dem demança wî di nava erebê de ye, xwe elimandiye, divê demança wî li ber destê wî be. Bes şeva çûyî gava ji nexweşxanê vedigere, ji bîr dike ku demançê di nava erebê de bihêle, demançê dixe bin balîfa xwe û li wir ji bîr dike.
Saet navbera yek û yek û nîv digîhîjin ciyê karê Ferîd. Ferîd li daîra xwe karê xwe dike, ji wan re dibêje karên min xelas
90
nebûye, ger hûn biçin sûkê û piçekî bizivirin, ez ê karê xwe xelas bikim û li benda we bim.
Di wan rojan da rewşa Swêregê bê huzûr e, Ado bangî Ferîd dike û jê dipirse, ka talûkeyek hember wî heye an tune? Ferîd ji Ado re dibêje, na, ji bo min, ji bo jiyana min talûkeyek tune, ji

bo xatirê min tedbîr girtin ne hewce ye. Ado bi gotina Ferîd baweriya xwe tîne. Ado û Huso diçin sûkê, zikê wan birçî ye, diçin loqanta îsmail. Loqanta îsmaîl li ser kuça Hurriyetê ye, dolmîşên Diyarbekîrê ji kêleka loqantê radibin.
Misto ji gund nuh gîştiye Swêregê, wê li dolmîşê siwar be û biçe nîşana Reşo, xebera wan ji hev tune ye. Gava Misto ji ber loqantê derbas dibe, Ado û Huso wî dibînin û bangî hundir dikin, Misto jî zikê xwe.têr dike. Ado ji Misto re dibêje dev ji dolmîşê berde, di ereba min de ji te re jî cîh heye, em hemû tev biçin. Misto dibêje, baş e.
Her sê heval nanê xwe dixwin, perê xwe didin û ji loqantê derdikevin. Ereba Ado Renoyek kesk e, Huso li ciyê xwe, li pêşiyê rûdine, Misto li paş Ado cî digre, bi rê dikevin û diçin ba Ferîd, karê wî xelas bûye, derdikevin der, Ferîd li paş Huso, li kêleka Misto rûdine, saet li dora sisêyan e. Sê-çar deqîqan da digîhîjin ber mala Ferîd. Ferîd dibêje hîin piçekî li wir bisekinin, ez derkevim jor Ruhsar û Yekbûnê bînim. Ferîd bi gavên sivik û lez dikeve hundir, ji nêrdiwanan derdikeve jor, li zengilê derî dixe, Ruhsar derî vedike. Yekbûn xwe davê himêza bavê xwe, ew bêsebir e, beriya ku Ferîd were malê, xwe hazir û nazir kiriye, li erebê siwarbûnê hez dike, hele gava bi bavê xwe re li erebê siwar dibe ji kêfan difire. Wî rojê heta bavê wê tê mal belkî pênce carî ji diya xwe dipirse, ka bavê wê ewê kengê bê mal.
91
Gava Ferîd tê mal êdî teqeta Ruhsarê nemaye ku bersîvan bide Yekbûnê. Ruhsar dibêje Ferîd, tu û Yekbûn herin jêr, ez jî li pê we dadikevim.
Berê Ado ber bi deriyê apartmanê ye: Yek kes ji apartmanê

derdikeve, li serê wî şewqeyekî Swêregê heye, eniya wî fire, biryên wî qalind û sifetê wî esmer e. Simbila xwe qurisandiye. Ew camêr ji derî derdikeve, li ser piyê xwe yê rastê dizivire û ber bi paş apartmanê diçe.
Li pê wî, Ferîd ji apartmanê derdikeve, Yekbûn li pêş wî ye. Adem û yên din bala xwe dane Yekbûnê. Yekbûn sê sal û nîv e. Ferîd û Yekbûn digîhîjin ber erebê, Ferîd dixwaze, Yekbûn li pêş, di himêza Huso de rûne, lê belê Yekbûn dike mizmiz û digirî, ew naxwaze li ba Huso rûne, dixwaze li himêza bavê xwe rûne. Ruhsar hîna ji apartmanê demeketiye, carekê de reqîna demançê dest pê dike. Ado çavên xwe dizivirîne ciyê ku deng jê tê, camêrê ku bîska berê zivirîbû paş apartmanê niha, ji aliyê dinê derketibû pêş û gulleyan li Ferid dibarîne. Paşiya Ferîd bi mêrkuj de ye, dora heşt gulleyan li ser pişta Ferîd dibarîne, Ferîd di ciyê xwe de dikeve erdê, Huso jî ji koltixa xwe ya pêşî dikeve erdê. Misto ji Ado dipirse, ka sîlehek heye an tuneye? Ado dibêje na. Misto û Ado xwarî erdê dibin û bi kulmên xwe çaqilên kêleka rê digrin û davêjinn qatil, qatil li wan dizivire û çend gulleyan jî berdide wan, ew xwe davên erdê. GuIleyên li wan tên barandin, rastî baxaja erebê tê.
Qatil, di navberan xaniyên karkeran û Mekteba yatilî de, ber bi Esmerçayirê ve baz dide. Ado û Misto xwe davên ser Ferîd û Huso, çi tê serê Yekbûnê, ne Ado û ne jî Misto dizane. Ji Ferîd deng demakeve, ji serê Huso xwîn tê, Ado dibêje qey wî ji serê
92
xwe derb xwariye, bes dû re fam dikin ku, gulleyek li erebê ketiye û perçeyek hesin ji qaporta erebê jê bûye û li serê wî ketiye.

Misto Huso dike himêza xwe û li qoltixên dawiyê de rûdine, Ado jî Ferîd li ser qoltixa pêş dirêj dike, serê wî li ser çoga xwe ya rastê datîne û destê xwe yê rastê dide ser sifetê Ferîd, bi destê xwe yê çepê erebê dajo. Nav du deqîqan da digihîjin ber nexweşxanê, gava Ado, Ferîd ji erebê derdixe wî dizivirîne, wê gavê dibîne ku sînga Ferîd di xwînê de maye. Gulleyên li pişta wî tên barandin ji sînga wî derketine.

Ruhsar tiştekî nabîne, gava Ruhsar derî digre û ji nêrdiwanan ber bi jêr dimeşe, dengê gulleyan digîhîje wê, ew dibêje qey hinek mîx di texteyan de dikutin, di carekê de çend pîrek bi qîrîn û hawar ji nêrdiwanan ber bi jor hildikişin, Ruhsar bê huzûr dibe lê cardin tiştekî fam nake, gava çavên wê li atqiya Ferîd a di destê jinikekê de dikeve, dinya wê bi ser wê de tê xwarê.

Ruhsar laşê Ferîd nabîne, Ruhsar dibêje Paşa, ez yek caran dixwazim û hêvî dikim ku ev serpêhatiya min ne rast e, hemû xewnên şevan e, hevalên Ferîd ew veşartine û rojeke xweşik ewê Ferîdê min ji min re bînin.

Bavê min gava Ferîd tê kuştin bi rê ve ye, ji aliyê Ruhayê bi ereba xwe ve tê Swêregê, li gel bavê min hevalekî wî heye, yê erebê dajo birayê min e. Bavê min li ber yazixana xwe dadikeve. Bîskek şûn da xebera kuştina Ferîd digîhîje bavê min.

Bavê min baz dide mal, gava dikeve hundirê enûgê hawarek ku dilên dayik û xwûnga perçe dike ji xwe derdixe. Qîrin û hawarek dikeve hewşa me, orta rojê çav çavan nabîne, kî çi dibêje kes fam nake. Diya min xwe davê ser bavê min, ew dibê qey

93

ez hatime kuştin, bavê min dibêje Sadê! Sadê! Ferîd kuştin! Êdî diya min xwe wenda dike, çi tê devê wê ji bavê min re dibêje.

Qurçimyo! Pergala te bela be, dilê te niha rehet bû? Te digot Ferîd û Ferîd, niha Ferîd çû, em ê çi xweliyê li serê xwe kin? Bavê min xwe ji însanan pir zû aciz dikir, bes herî zêde xwe ji rehmetiyê xalê Evdî û xalo Ferîd aciz dikir. Gor wî ev du kesan zarokên wî û zarokên xelkê ji sêrî derdixistin. Diya min ev dizanîbû, ji ber wê yekê nifirên herî giran lê dikirin. Bavê min li pêş, diya min li pey wî berê xwe didin nexweşxana Swêregê û baz didin. Bi rê ve dakê Kejo û abla Nazo, diya Ahmedê pismam, bi dû diya min dikevin. Gava ji deriyê nexweşxanê dikevin baxçe, çavê diya min li Husênê Bro dikeve, diya min ji Husên dipirse, ka Ferîd sax an ne sax e. Husên dibêje bi Ferîd tiştek nebûye diya min, piçek lingên wî birîndar bûye, ewê wî bînin malê. Lê belê diya min zû fam dike ku Ferîd çûye, naxwaze dakê Kejo diya Ferîd, biçe hundirê nexweşxanê.
Diya min hêsiran nabarîne, wî gavê zexm û xurt dibe. Ji diya xwe ra nabêje Ferîd mirî ye. Diya xwe û hinek pîrekên din li erebeyekê suwar dike û tîne malê.
Dinya li diya min reş dibe, beriya Mehemedê wê û niha jî Ferîdê wê, çûkê wê, şîrîn û şekirê wê, tenbûrvanê delal, hewalbend û rêberê xelkê me yê reben, li nexweşxana Swêregê çavê xwe digre. Yê li Ferîd gulleyan dibarîne, zarokê erdê me ye. Zimanê wî, jiyana wî, derd û kulên wî kêm zêde wek ên Ferîd in. Li esmanê bajêr stêrk diçirûsin, ne parçekî ewr û ne jî baran heye. Şevek ji şevên payizê, ronî û germ. însanên ku Ferîd nas dikin, hez dikin, ji serî heta bi nenûkên lingan bûne agir û dişewitin, li hev dipiçikin û digirîn.
94
Piştî çend saetan cenazê Ferîd digihîje mal. Bi hatina cenaze

re qiyamet radibe, qîrîn û hawara însanan li esmanê Swêregê wek brûskan dişîrqe. Swêreg hêsiran dirijîne, kal, pîr, zarok û zêç, her babet însan, li kuçan, li xaniyan digirîn.
Yên ku Ferîd dîtîne, yên wî nas dikin, hevalên wî, dost û nasên wî, nedikarin qehra dilê xwe û ne jî hêsirên çavên xwe veşêrin.
Di wê qiyametê da dest û ling li hev dikevin, însan li xwe şaş dibin, nizanin çi bikin, nizanin çi bibêjin. Apê Sefo jî di wê rewşê de ye, ji agir û qiyameta dilê xwe nizane çi bike. Diçe bi pêsîra pîrika min a Bêzê digre:
-Meye vir! Meye vir!
-Yê lawê min kuşt torinê te ye, Paşa ye! Û tu serda jî tê şîna min!
-Neviyê min kî ye? Torinê min kî ye? Ya sitar Sefo! Torinê min, torinê te ye. Em ê tiliya xwe çawa di çavên xwe ra kin?
Dengê Bêzê naçe guhên apê Sefo, kî jê re çi dibêje fahm nake, agirê dilê wî hiş li serê wî nehîştiye. Gotina xwe dom dike, Paşa lê xistiye..
Êdî Ruhsar nikare li ciyê xwe rûne, radibe ser xwe, diçe yaxa apê Sefo digre û dibêje:
-Paşê lê nexistiye! Paşê lê nexistiye! Dev mavê Paşê! Ji xwe ra wek dinê bifikire, heşê xwe bîne serê xwe, Paşa, Paşayê te ye.
-Wa...?Wa...?
-Wele ez rast dibêjim, yaxa jinikê berde!
Bê lome be, kezeba apê Sefo şewitîbû.
»1
95
Dûre çi dibe?

Li vir dixwazim li ser çend noqteyan bi kurtasî dîtinên xwe bêjîm.
Yek; ji kuştina Ferîd heya nuha hinek însanên siyasetmedar û ronakbîrên kurd hîna jî xwe ji zîhniyeta eşîr û eşîrtiyê xelas nekirine, dibêjin "Mala Brodireja" xwe bêdeng kir.
Ez dibêjim têkiliyên xurt û zexm ên eşîrtiye di nav mala Brodirêja de tunebûn û tunene. Min bi çavên xwe têkiliyên wan dîtine û jiyame jî. Bes navnîşanê wan ê kurdî xurt e. Salên ku ez û Ferîd mezin dibin, bav û kalên me, dê û xwungên me bi kurdî dipeyivin, çîrok û kilamên xwe bi kurdî dibêjin, şîn û dawetên xwe bi kurdî dikin. Tiştê ku vê malê yan vê malbate balkêş dike ev xusûsiyet e.
Di xortaniya xwe de em dibin kurdperwer, çep û sosyalîst, em dibin parçeyekî miletê kurd, dibin neferên serwext û zane. Êdî tevgera me, fikrên me, bîr û baweriyên me li ser têkiliyên kurdperwerî û rengên siyasî ava dibin. Loma em her yek dikevin nav
96
rexekî: Ez di nav DDKD de cî digrim, Ferîd di nav KAWAyê de, Mehemed di nav KOMALê de. Encama me va ye. Nuha gava hin siyasetmedar yan ronakbîr dibêjin "Mala Brodirêja" ez ê ji sergêjên wisa re bersiveke çawa bidim?
Didu: Ez kitêba "Xalê min Ferîd" wek sawciyekî, wek hakimekî, serekeşîrekî yan wek siyasetmedarekî nanivîsim. Ferîd bi kêmasî û qusûrên xwe ve xalê min bû, min jê hez dikir; ji bo min ew stêreka şevên tarî bû. Siyasetê em kirin neyarên hevdu. Min xwest bi nivîsarên xwe ez wê neyartiyê bikujim, nêzîkî wî bim, jê efû bixwazim û jê re bibêjim: Binêre, ez bi zimane te dinivîsim, min bi saya heval û hogirên kurdperwer ên

wek Sîno Xurşîd kilam û helbestên te bi dest xistin û bi cî kirin, min tu ji bîr nekir û hêviya min ew e ku xelkê kurd jî te ji bîr neke. Dibe ku siberoj bi navê te mektebek ava bibe, kurd navê te li kuçeyekî an li parkekê bikin, li ser jiyana te fîlîmek çêbe, kilamên bi deng û sedayê te li hemû Kurdistanê belav bibin. însanên binamûs û kurdperwer, însanên ku hurmeta wan ji tarîxa xwe re heye û qîmet didinê, wê li te û li hevalên din xwedî derkevin. Li hember qatilan wê we yekayek vejînin. Rojên ku zarokên me li dibistanan jiyana we û têkoşîna we bixwînin wê werin. U bi vî hawayî em ê bersiva qatilên te bidin û bi vî hawayî em ê "heyfa" te bigrin.

Sisê: Di pirsa kuştina Ferîd de gelek tişt derketine holê

-Nivîsara Çetîn Gungor (1)

-îtîrafên H. Huseyin Karakuş (2)

-Gotinên Serhat Bucak (3)

-Nivîsara îbrahim Kureken ên di "Kurd Info" yê de. (4)

-Gotinên Ali Yaverkaya (5)

97

Bes înformasyonek ku vê sala dawiyê derketiye hole, ez beriya 27 salan, roja ku Ferîd tê kuştin, êvarê ji Ado (6) û Ibrahim Kureken re pêşkêş dikim.

Ez vegerim ser roja 22yê Çiriya Paşîn a 1978an.

Gava xebera gullebarandinê digihîje me, ez li komelê me.

Saetek derbas nabe Ahmedê cîranê Ferîd (7) tê ba min. Dixwaze behsa wan du kesên xerîb bike, du kesên ku wî û diya xwe li dora apartmanê dîtibûn. Ez dibêjim baş e, eşkalên wan ji min re bêje. Eşkalê ku Ahmed tarîf dike weha ye: Xortekî bejna wî normal, eniyekî fire, similê qusandî, sûretekî esmer, briyên qalind û

reş, li serê wî şewqeyekî Swêregê heye. Ahmed nikare eşkalê zilamê din tarîf bike.
Ev tarîfa ku Ahmed kiriye û kesên ku min sibê li komela me dîtine wek hev in. Ez matmayî dimînim. Ji Ahmed careke din dipirsim, lê tarîfa wî nayê guhertin. Zilamên ku min û Ahmed dîtine wek hev in, eşkalên wan hevdu digrin. Çend roj berê ev her du kes li kuça Hurriyetê tên dîtin. Yê wan dibîne merivê min e. Li ba wan zilamek ji Sêwregê heye. Zilamê ku bi wan re zilamekî siyasî ye. Dikevin dukana merivê min û li wir tiştekî dikirin. Ez gava vê nivîsarê dinivîsim, ji wî merivê xwe re telefon dikim û dixwazim careke din li wî guhdarî bikim. Ew dibêje min tiştek wisa ne dîtiye û ne gotiye. îhtimal e ku nayê bîra wî, bes ez bi hafiza xwe bawer im. Roja ku Ferîd hat kuştin, ez bi gotina wî dibim şahidê vê înformasyonê. Divê em vê înformasyonê bidin hevalên KAWAyê. Ferîd heval û hogirê wan e, serekê wan e, ji her kesî zêtir heq û huqûqê wan heye ku ev înformasyon têkeve destê wan. Ez wisa difikirim û wisa biryarê didim.
98
Êvara 22ê Çiriya Paşîn, roja ku Ferîd tê kuştin em li mala Qerto, li xaniyê wan ê ku li paş şirketa Elektrîkê nuh ava kiribûn, berhev dibin. Ez, Qerto û Ednan ji DDKDê û ji KAWAyê jî îbrahîm û Ado. Ez ji wan re xeber dişînim, ew dibêjin baş e û tên mala Qerto.
Ez di huzûra cemaetê de behsa wan du kesan dikim û eşkalê zilamê bi şewqê Sêwregî ji wan re tarîf dikim. Ado ne kêm û ne zêde dibêje. Tarîfa te rast e. Piştî ku Ado tarîfa min tesdîq dike, ez dibêjim şaş fam nekin, ez naxwazim ji we re bibêjim fîlankesan

Ferîd kuştiye, lê ev du kes çend roj berê li kuça Hurriyetê bi zilamekî siyasî re hatine dîtin. înformasyona ku me dixwest hûn bizanibin ev e, êdî hûn çawa difîkirin û çawa hereket dikin, mesela we ye.
Em bêyî van gotinan zêde tiştekî nabêjin. Gora qenaeta me ya wê gavê, Ferîd hevalê wan e û divê ev malûmata hanê bigihîje wan. Civîna me ya kurt xelas dibe. Em radibin.
Û ji wê rojê heta ku ez dest bi kitabê dikim, têkilya min û Ado çênabe. Gava ez dest bi vê kitabê dikim, beriya her kesî ez diçim ba Ado. Demeke dûr û dirêj derbas bûye, gelek heval hatine guhertin, gava ez li wî dinêrim, ez dilekî pak û zelal, dilekî henûn û kurdperwer dibînim. Ji ber vê yekê kêfa min tê. Eşkalê ku min ji wî re beriya 27 salan behs kiribû, ez careke dinê behs dikim. Ez dixwazim careke dinê ew wî eşkalî teyîd bike. Ew dibêje, Paşayê ku li Ferîd gulle barand, heta ku ez bijîm ji bîr nakim. Eşkalê ku tu behs dikî û camêrê ku min dîtiye yek e. Di vî warî de şika min tune. Li gel min hevalek heye, ew jî dibe şahidê vê gotinê. Em ji hevdu xatir dixwazin û radibin. Beriya ku ez ji Diyarbekîrê veqetim, careke din wî dibînim.
99
Gava ez di hefsa Diyarbekîrê de radikevim, ji doza PKKê H. Huseyin Karakuş dibe îtirafçî. Di îtirafa xwe de dibêje me Ferîd daye kuştin û yên emrê partiyê haniye cîh Emin Dal û Ali Yaverkaya ne. Xeber balkêş e, bes ji bo min têr nake, divê ez rismekî Emin Dal bi dest xim. Bes çawa? Herî dawiyê rehmetî Emin Yavuz ji min re dibe alîkar. Beriya ku em werin hefsa Numre-5 (5 Nolu Cezaevi), ez û Emîn di hefsa yekemîn de di qawîşekê de dimînin. Di lêpirsînê de bi zora lêdanê ji PKKê re

çêr kiribû, PKKê jî ew tecrîd kiribû. Ebdekî Xwedê bi wî re nedipeyivî, kesî xwe nêzîkî wî nedikir. Cama ez pê re rûdiniştim, me suhbet dikir, di demeke kin de em bûn dostên hev. Di hefsa pêncemîn de PKKê efû îlan kir, Emin jî ket ber efûyê, dûre ket rociya mirinê û wefat kir. Xwedê wî bi rehma xwe şa bike.
Li ba girtiyekî Hîlwanî rismekî Emin Dal heye, Emin Yavuz bi soza risim li xwedî vegerîne, ji min re tîne. Ez li wî rismê biçûk dinêrim û teslîmî Emin Yavuz dikim. Camêrê ku roja gullebarandinê tê komela me ew e. Tu şika min namîne. Di wî rismî de jî simêlê wî qusandî bûn. Bes niha piştî 27 salan ez rismekî din bi dest dixim, cardin di wî rismî de jî her tişt hevdu digre. Bes di vî rismî de Emin Dal bê şewqe ye û simêlê wî nequsandî ye.
Di gotinên xwe yên Intemetê de Ali Yaverkaya dibêje, "Yê Ferîd Kuştiye Emin Dal e, ne ez im."
Gor min Alî rast dibêjê, gava Emîn gulleyan li ser Ferîd dibarîne tenê ye, li ba wî kesekî xuya nake. Dema Emin Dal sibê zû tê komela me, li ba wî zilamekî din jî heye, cardin li dora apartmana Ferîd, Emîn Dal û zilamekî din tev tên dîtin, lê gava gullebarandinê Emin Dal tenê ye. Zilamê ku li ba Emîn Dal tê dîtin kî ye? Gava gullebarandinê ew ku da winda dibê?
100
Ez naxwazim li Alî neheqiyan bikim, lê, dibe ku ew bikaribê bersiva van sewalan bide.
Rojên pêş ew ê vê noqtê jî zelal bikin.
Hêviya min ew e ku yên biryara kuştina Ferîd didin, bi kêmasî ji wan yek kes bi cesaret û bi mêranî rabe ser xwe û vê bûyerê eşkere bike, mijûyê xwe, wicdan û mhê xwe azad û sivik bike.
Meseleya din jî ev e, tiliya Bucaxiyan di kuştina Ferîd de

tune. Li dû kuştina Ferîd, Bucaxî xeberê dişînin ku tu eleqeyekî wan bi vî karî tune û dixwazin werin şîna Ferîd rûnin. Hevalên KAWAyê daxwaza wan maqûl dibînin û ew tên şîna Ferîd.
Û ji aliyê min, ji roja ku Ferîd hatiye kuştin, heya niha tu carekê min ji kesekî re negotiye ku Mala Bucaxiyan Ferîd kuştiye. Ne ji merivên xwe re û ne jî ji hevalên xwe re.
Beriya şerê Sêwregê dest pê dike, ez û çend heval, em ji DDKDê veqetiyan. Gava şer dest pê dike, em dibêjin ev şer derveyî îradeya me derketiye, li hember êrişan em ê li ba xelkê cîhê xwe bigrin, em ê di rojên teng de li ba wan bin. Dibe ku wê gavê em nikarin encamên siyasî bi teferûat analîz bikin, lê ez hîs dikim ku şerê Sêwregê di bingeha xwe de li hember hereketa kurd, li hember serwexbûyînê, li hember şiyarbûna gelê kurd e. Armanc sabotekirina vê pêşveçûnê ye. Kes me fahm nake, yan jî naxwazin fahm bikin.
Hevalên min ên DDKDê, PKK, rojnameyên tirkan ji bo me dibêjin, ew dixwazin heyfa Ferîd bigrin, ji ber wê yekê li Sêwregê dimînin. Bi taybetî di nav hevalên DDKDê de ev gotinên hanê li hember min tên bikaranîn. Neco kiribûn qaçaxçî, min jî dikin eşîretçî. Li gelek ciyan û li gelek cemaetan ev gotina bi zanîn yan nezantî tê bikaranîn.
101
Hevalên KAWAyê jî xwe kerr dikin, înformasyona ku ez didim wan di pişt guhên xwe re davêjin. 27 sal şûn de ez ji Ado û Brahîm dipirsim ka wan ji bo çi înformasyona ku min dabû wan avêtin pişt guhên xwe? Bersiva ku didin min wisa ye: "Gor qenaeta me, we dixwest em û PKK têkevin rûyê hev ku meydan ji we re bimîne."

Gava hevalên KAWAyê wisa difîkirin û hevalên DDKDê me bi eşîrtiyê îtham dikin, li ser me agir dibare, kevneperestên ku hefsarên xwe diqetînin, gulleyan li ser heval û hogirên me, malên me, merivên me, pîrek û zarokên me de dibarînin. Kemal Uzun, pismamê min, hevalên min ên delal û xweşik Zubeyir Mizrakli, Esat Yildirim, Mustafa û Nasrettîn îbîş tên kuştin. Pismamê min Mehemed û Elî Uzun gava ii berberxana xwe ya li Qeleboxaziyê kar dikin, mêrkuj gulleyên xwe li ser wan vala dikin. Namirin, lê dikevin halekî xirab; dest didin ser garaj, yazîxana otobus û loqanta bavê min û hîna jî di destê wan de ne. Tu kesek ji merivên me nikarin biçin ser kar û barên xwe; tî û birçî li malên xwe rûdinin. Yên ku xwe ji destê kevneperestan, cendirme û polîsan xilas dikin, mal û mulkê xwe, erdê bav û kalan berdidin û dikevin ser riya maciriyê. Ne tenê merivên min, xelkê reben û belengaz, bêsuc û bêsebeb tê kuştin, tê girtin, ji lêdan û îşkencê derbas dibin, mal û mulkê wan talan dibe û hwd.

Naxwazim zêde dirêj bikim, bi şerê Sêwregê re li hember hereketa kurd komplo çêdibe, komplo bi kuştina Ferîd dikeve tetbîqatê û gava komplo bi ser dikeve eniya welatparêzan winda dike, yên winda dikin em hemû ne.

102

l.Çetin Gungor (Semir), yek ji damezirînerên û endamê komîteya merkezî ya PKKê bû. Dema wek berpirsiyarê PKKê li Ewrûpayê kar dikê, ji PKKê vediqete. Sedemên veqetandina xwe bi daxûyaniyekî ji 34 rûpelan di tarîxa 1984. 08. 16 de ji xelkê kurd û tirk re pêşkêş dikê. Li wir behsa kuştina Ferîd jî dikê. Çetin Gungor di 1 986an de bi destê PKKê li Swêdê tê kuştin.

2.Hasan Huseyin Karakuş ji Sêwasê ye, di herêma Hîlwan-Swêregê de wek qomutanê eskerî yê PKKê kar dikê û tê girtin. Di hefsa pêncemîn a Diyarbekîrê de dibê îtirafçî û cara yekemîn behsa kuştina Ferîd dikê. (Dadgeha Orfî-îdareyê (Sikiyönetim mahkemesi) ya Yekemîn, îfada wî ya dawiyê ku li dosya 1981/134 an. e.n.) Gor îfadeyên wî PKKê Ferîd daye kuştin û yên wezîfa kuştinê aniye cîh Emîn Dal û Alî Yaverkaya ye. H. Huseyîn Karakuş ji hefsê derket, nuha bi çi mijûl dibe, li ku dijî ez nizanim.

3.Serhat Bucak lawê Faîk Bucakê ku damezirîner û sekreterê Partî Demoqratî Kurdistana Tirkiyê bû. Serhat jî wek min ji Swêregê ye, abûqat û siyasetmendar e, wek hemû kurdan bi siyasetê re mijûl dibê, nuha nizanim rewşa wî çi ye, lê demekê ew jî di nav PKKê de dixebifî. Di wê demê de, gava ji Ewrûpayê dizivire Tirkiyê, Mustafa Aksakal wî bangî mala xwe dike û jê re dibêje, hevalên me kuştina Ferîd itîraf dikin û li xwe rexne digrin. Mistefa jî ji Serhat re dibêje, ger hevalên te dilsoz in bila di huzûra xelkê de, di weşan û rojnamên xwe de li xwe rexne bigrin.

Ev înformasyona di nameya ku Mustafa Aksakal ji min re dişînê, cîh digre. Yê di vê kitabê de bi navê Misto cîh digrê, Mustafa Aksakal e û ji gundê Hîlwanê ye. Mustafa hevalê Ferîd e.

103

4.Yê di kitabê de bi navê Brahîm cîh digrê îbrahîm Kureken e. Di tarîxa 27. 11. 2005an de di malpera Kurdînfo de, bi navê "Bîranîna Ferîd" nivîsarekî wî cîh digrê. Di nivîsara xwe de behsa kuştina Ferîd dikê. îbrahîm jî wek Mustafa hevalê Ferîd e, ji Swêregê ye. Roja ku Ferîd tê kuştin li Anqerê ye, nagîhîjê ser

cenaza Ferîd.
5.AlÎ Yaverkayajî wek Emîn Dal ji xelkê Hîlwanê ye, cardin wek Emîn di destpêka PKKê de wek milîtan di kar û barên PKKê de beşdar dibe. Alî jî wek gelek kesan hat girtin, di hefsa Pêncemîn de hember zilm û zorê li ber xwe da, ji hefsê derket û cardin li nav PKKê cîhê xwe girt. Nuha ji PKKê veqetyaye.
Di malpera Nasnamê de, di tarîxa 24. 11. 2005an de bi navê Xoca, zilamek ji Alî Yaverkaya dipirse:
-Her kes dibêje te Ferîd kuştiye?
-Her kes wisa dizane û wisa dibêje, lê ez bi dilsoziya xwe dibêjim ku yê Ferîd kuşt ne ez im.
-Kî ye?
-Emîn Dal e.
-Pekî, yên emir dane kî ne?
-Tu jî dizanî ew kî ne, tu bi xwe jî di bin emrê wan de xebitiyî.
-Belê.
Cardin Ji derveyî gotinên jorîn, Alî ji derveyî resmiyetê (gayrî resmî) wisa dibêjê, "Konseya eskerî ya ku wê gavê ji Mehmet Karasungur, Riza Altun û Fehmî Yilmaz pêk hatiye, biryara merkezî ya kuştina Ferîd bi destê Emîn Dal tetbîq dike." Mehmet Karasungur li Kurdistana Başûr tê kuştin, Emîn Dal jî hatiyê kuştin. Riza Altun li Ewrûpayê dijî û mirovê PKKê ye.
104
Fehmî Yilmaz, eslê xwe laz e, di hefsa Yekemîn a Diyarbekîrê de li qawîşa min dima. Çetîn Gungor di daxuyaniya xwe de dibêjê, "Gava Fehmî Yilmaz tê girtin, esker dibe ku ew mirovê MÎTê ye." Cardin dostê min rehmetî Emîn Yavuz ku ew jî di

qawîşa min de dima, ji min re digot, "Paşa, bi vê zilamî re zêde qisa meke, ew mirovê MITê ye." Fehmî Yilmaz ji hefsê derket û nuha li îzmîrê dijî.

6.Ado hevalê Ferîd e, yê ku gulleyan li Ferîd barandibû, wî bi çavên xwe ditibû.

7.Cardin xortê ku ez jê re dibêjim "Ahmed" wê gavê sempatîzanê me yê DDKDê ye.

105

Bayê Azadiyê

Bayê Azadiyê va ye tê, ha tê

Bayê Azadiyê va ye tê, ha tê

Rabin, rabin, rabin, rabin bes êdî, ji xew rabin

rabin, rabin, rabin bes êdî, ji xew rabin

rabin, rabin, rabin bes êdî, ji xew rabin

bes êdî, ji xew rabin

Bêjin, bêjin bêjin bes êdî koletî, bêjin

Bêjin, bêjin bêjin bes êdî koletî, bêjin

Bes êdî koletî

Govend û defêdîji bo Kurdistan e

Govend û defêdîji bo Kurdistan e

Zilgit, zilgit, zilgitji bo azadiyê

Zilgit, zilgit, zilgitji bo azadiyê

Zilgit, zilgit, zilgitji bo azadiyê

Ji bo azadiyê

Bêjin, bêjin, bêjin bijî azadî, azadî

Bimre koletî, koletî

Bimre koletî, koletî

Bêjin, bêjin, bêjin bijî azadî, azadî

Bêjin, bêjin, bêjin bimre koletî, koletî
Bimre koletî
Gotin û muzîk: Ferîd UZUN
xalê min ferîd
Her cara ku diya min behsa serpêhatiyên xwe yan behsa bûyeran dike ez mat û heyran dimînim. Di gotinên wê de wext nîn e; ne saet, ne meh û ne jî sal... Wek em hemû însan di wextek bê serî û bê binî de dijîn, mesafeyên di nava bûyin û mirinê de wenda dibin. Diya min heyşt zarok anîne dinê, lê kîjan rpjê an kîjan mehê zariyên wê çêbûne ne ew û ne jî kesekî din dizane.
Xwedê bi rehma xwe şa bike, apê min Hesen tarîxa bûyina zarokan bi destnivîsa xwe li paş resmekî ku me xistibû nav çarçoveyek û bi dîwarê odê ve bi dar da kiribij, dinivîsand. Gava ez ji hefsê deri<etim ew resm jî wek gelek tiştên din wenda bûbû. Ferîd di bihara sala 1945an da tê dinê, bes ez dixwazim ji devê diya xwe guhdariya bûyina Ferîd bikim.
Ji rojan rojekê, biharê bi giraniya xwe çarşefeke şîn li erdê Swêregê raxistiye, bîhna kulîlk û nefelan daketiye ser Swêregê, diya min û xwungên wê li Helawikê, li nav bîstên dendikên zebeşan diçînin. Xebera xêrê digîhîje bîstên ku dakê Kejo lawikek aniye dlnê. Navê Ferîd li lêwik dikin. Beriya Ferîd sê keç û sê law hene, Ferîd dibe zarokê heftan, êdî li pêy Ferîd dakê Kejo zaro çê nake. Ferîd dibe zarokê dawî, dibe şîr û şekirê malê. Ew dibe zaroyekî blharê, zarokê kulîlkan, nefelan, giyayên êşîn. ... y
ISBN •17Sb57aDR-'1
XShtc
9"789756"278093
Xelîl Cibran

**

XECA BERLÎNÎ

Roman

Hesen Îbrahîm

11 . 11 . 2008

Nürnbêrg

-1 –

- Navê min şêrûye..Heval dibêjne min şêr.

Jiber zîrekî û mêranyên min!

Lidur xu zifirî kes nedît bawer jê bikit.Şerm kir.

- Bibure,navê min yê rastî reşûye.Xelkî digotine min reşku.

Dengê xu nizim kir.

- Reşku yê êtîm,reşku yê şivan.

Serê xo şor kir,kasêta mejyê wî,kete karî. Bîrdanka xu ya reş vekir.Berî xu dahêlte kuratîya rojên nexoş.Berî tijî goha kenîya wan biçûkên çivêl,ewên yarî

pê dikirin bibit.

- Reşku yê bê xudan..

Şivanê nêrî û beran.

- Şelê wî yê dirîyaye..

Şîva wî digel ya saye.

- Mala wî pişta lîse..

Difina wî ya bikilmîşe.

-Reşku reşku bextê te.

Heker bû noba me..

-Tû newe mala me.

Dilê me dê reş bit..

Xwarina me dê nexoşbit...

Divîya dest dite gopalê xu û birahêlte kuma wan.

2

Dengê girtinê ji dergehî hat.Zanî ew herdû polîsên milên wî girtîn çûne derê.

Kes nema digel wan.

Kete beranberî wî dêmê befirîn,wan çavên şîn,wê pirça zêrîn..

Dû sê caran çavên wî ketine tora çavên wê yên tijî hîvî û bişkurîn.Neşîya xu

liber megnatîsê awrên wê yên tijî pirsîyar bigirt. Her zû çavên xu ji agirê lêvên

wê yên sor vekirin.

Çavên xu litiştekî dî gêran.Zendên xu perxandin.Cihê kelamça sor bibû..

Sêra çavên wî kete wê kuma kaxezên liser mêza dinavbera wanda.

Mêz ya dinîva joreka mezin û lêkday da. Herweku ew jor jibû wî amadekirî.da

xudana çavên şîn çavzilkanê digel bikit û mayê xu Dihemû hur ü girên jîyana

wî da bikit.Tijî wan kaxeza xwîna birînên wî bikit.

Serê xo bilind kir,berê wî kete wî kevalê bidîwarê lidestê wî yê çepê hilawîsitî.

Wênê daykekê ya şîrî didite biçûkî xu yê sava.

Bîrdanka wî peqî...

Xecê pişta xu ya daye lanka kiça xu. benduşka sîngê xu vekir.Hinareka sipî jê

îna der.Serê wê yê rengê hingivînî kire didevê kiça xu ya sava da.

Destê xu bire paxla wê,memkê dî îna der. Devê xu havête bişkujka wî,wek

biçûkek sava memkê xecê mêt.

- Ez jî savayê teme.Min jî şîr divêt.

Kenîya wan tijî gondî bû.Pêlên wê gehiştine jora wan.Dêmê şêru nexşandin.

Xudana pirçê çend serqelem jikenîya wî tumar kirin.Zanî yê lirojên burî dijît.

Dengê qelem û kaxezan.berê wî da wê pencera mezin ya liberanberî baxçekê

ciwan û lêkday.Tijî çava ronahî bû.Digel tîjkên bînahîya çavên xu dişuşa

pencerê ra derkete cîhana azadîyê.

Jîyan dikuka xoşî ü berxodanê daye. Deng û livîn goha disimin.

Biwê cada mezin û tijî jîyan,jurda çû xwarê.Bazar yagerme.Hîvî diavizin.

Paşeroj ya arîyaye.Tijî dest ü ber milên hemüyan dîyarî û tiştin.

Kenî jipaxlên firîşta wek befira serê sala dibart.

Qelem kuxî..Hizirên wî revîn,wek mişka xu veşartin.

Serê xu şorkir.zanî ew hizir û ew hîvî ne mavê wî bûn kirîn.Zanî ew ne hejî wê

jîyanê ye.

Berê wî kete rexê rastê yê jorê.Çavên wî ketine wî kevalê mezin.

Îsa pêxember yê xaçkirî ye,tijî rexa firîşte û qotabyên wîne.Hemû yên jitirsa

diriçfin,çu jikesê naêt.Kes harî nakit,kes jixaçkirinê rizgar nakit.Kes mayê xu

dikarê xudê nakit.

Dengê îsay bilind bû....

- ew xudayê ez hinartîm,jibu hişiyarkirina hewe!ew berpirse ji xilaskirina min!

3

hün xema min nexun.tinê bizanin,ez kurê xudê me...

Kaxez livî,qelem siwarê canîyeka şemboze. Mejyê wî yê belav,kum kire ser wê

mêza tijî kaxez...

Deng ji wê telefona rengê sor hat.Bidestê çepê da bergohê xu.Telefon digel

destê wê dibin pirça zêrîn ve berze bûn.Tinê bişkurîn û sipêde baş jilêvên sor

barîn.

Şaşa kumpîwterî rexekê mêzê yê girtî.Perdxa ava libersîngê wê peqşik yên

biser dikevin.

Dilê wî na çite vî rengê avê.

Her ava henefîya nav malê vedixwar.

Xecê digotê.Her dê mînî reşoyê şivan.Her dê digel pezî û seyê xu ava cûya vexwy...

Serê xu bilind kir,dû çavên şîn yên libenda wî. Vîya hêşta xu mijûl bikit.Dengek

dijwar ji kaxezekê hat,qelemî hindek peyv nivêsîn. Zanî ya lihîvîya wî,zanî

qelem yê livîn û axivtinên wî tomar dikit.Zanî bêhna wê gelek ya firehe,lê nabit

roja xo hemüyê bihizir kirinê ve biburînit.

- Birastî ez nizanim kengî jidayik bûyme!

Qelemî lez kir..

- Kes jî rastiyê nizanit.Min çu nasname nînin.

Çavên xu neqandin.Her weku hizireka kûr dikit.

- Gondyên me digotin.Tû wê şeva gondê me hatîye sotin,libnê gelî libin

tiraşekê jidayik bûy.

Wek ferza nivêjê,rojê dûcar ew bin tiraşa lê jidayikbûy ü ew kefirê dayika wî

libin şehîd bûy,zîyaret dikirin.Bû digirîya,dibû pistpsta devê wî (dua)dikirin.Ew

herdû cih,bu wî mezarên pîroz bûn.Cihê bêhnvedana wî bûn. Xem û

wastîyana wî lê vedirevîn.

Serê xu bilind kir,çavên xu vekirin,her weku lidujmnê xu digert.

- Piştî demekî kêm firokên dojmnî dayika min digel komeka gondîya kuştin.

Devê xudana pirçê peş bû.Ew çavên şên zîq bûn.Qelem dinav wan tilên xeyzeranî da har bû.

- Wek gondîya digot.Babê min pêçolka min da bersîngê xu û revande dişkevtekê ve.

Çavên wî ketine wî dêmê dinav wê pirça zêrîn da berzebûy.Her weku dilê wî

pê sotî.

- Çîrok dirêje.Dê serê te pêve êşt.

Serê xu jinav wê sîlava zêrî bilind kire enîya wî ya girê.Qelem sist bû.Deng jikaxezê nehat.

4

Ma lihîvîya lêvên wî yên dibin rîh û simbêla ve berze bûyin.

- Ez hind dizanim,dijyê Dûsalîya min da.babê min dişerekî dijî dagîrkerên welatê meda şehîd bû.

Jor bê deng bû.Qelem kete ser sîngê kaxezê.

Ew tilên gerdena qelemî digivaştin,da jehra xu darêşite ser kaxezê.Têkhatin,ü

têkçûn. Behîya şehîd bûna babê wî û ya dayika wî gêran.

Til û destan,xu havêtine êk.Rondik barandin. Sirudên nîştmanperweriyê gotin.

Til,Belavbûn.Kum bûn.Birîyar dan xebat berdewam bibit.

Serê sê tila gehişte wê perdaxa tijî av.Bilind kire wan lêvên sor.Wek sîlaveka

har,diwê gerdena wek şûşey,jorda hate xwarê.

Perdax kete ser mêzê.Dengê peqîna moşekekê jê hat.

Tila biser şorîve,qesta gerdena qelemî kirin. Wek gerukekê birsî.Man lihîvîya

lêvên wî yên qeşavî.

- Nizanim çewa ez mezin bûyme!Ü kê ez xodan kirîme?

Hizir têkelî suhbeta wî bûn...

- Tinê ez dizanim,demê ez bûyme genc.Dibû şer dinavbera mala Mamên min

û ya xalên min da.

Çûnemabû suhbeta wî bibite hizir..

- Pismamên min digotin.Reşku xwîna me ye, divêt bibite şivanê me.Xalên min

digotin. Reşku yê me ye,dê bite şivanê me...

Min çu desthelat nebû,min nedişîya çu birîyara bidim.

Muxtar û hindek rû sipîya mayê xu têkirin. Herdû binemal pîkً înan.Ez bûme

şivanê herdû binemalan.

Hizirê ser ji suhbetê stand.Kete zifiroka hizireka dijwar.Tijî goha dengê pezî

bû.Zengila beranê tovî ser lê hêrkir.Rewîna seyê gewir,pez kum dikir.

Kenîya xecê jîya hemû bêrîvana cûda bû.

Xu veder kir.Çavên reş lidelîvekê digerîyan. Da silav kite pismamê şivan..

Jor bê deng bû.Pêrîvan zifirîn gondî.Pez kete zîyanên xelkî.Rewîna seyê gewir.hizirên wî kirine helim û bilind kirine banê jorê.

Serê xu bilind kir.Dû çavên şîn yên hizirên wî kitkte wek kezîya divehînit.

Cihê xu xoş kir.deng jigewrîya xo îna.

- Heta lisipêdeyekî min pezê xu ligelîyekî diçerand.Hindek limin bûne mêvan.

Çend çekdarek hatine hindav serê min.Silav kirin.daxwaza harîkaryê jimin kirin.

Min zanî pêşmergene.Liwî demî pêşmerge dikêm bûn.

Hevalekî wan yê birîndar bû.Pîtivî dermana bûn.

Serê xu bilind kir.Da bizanit ka xudana pirçê daxivtinên wî digehit?!

5

Zanî çu peyv û livîn û hizir,jikafirê qelemê wê rizgar nabin.

- Piştî zanîn ez kurê şehîdî me.Gelek keyiva xu bimin înan.Kaxezek dane min,ez hinartme bajêrî.Linik hevalekê xu.Ew mane liber pezê min.

Her bilez wî hevalî ew derman amade kirin û digel min heta nêzîkî cihê wan

hat.

Min derman dane wan,hevalê xo derman kirin.Piştî çend roja çûne ser rêa xu..

Lê rengê wan,suhbet û lêkdana wan.Liser hizra min neçûn.Ez bûme aşiqê dîtina wan..

Her çend rojeka dihatine seredana min.

Ez dihinartme bajêrî,jibû karekî yan gehandina nameyekê...

Ez dirêj nakim.Lirojekê min xu digel wan dît.

Ez bûme pêşmerge.

Min gond û pez û xecê hêlan...

Peyva xecê,qelemê xudana çava rawestand. Serê xu yê dinav wê pirça zera

pelav.Bilind kire navçavên wî yên girê.

Deng jikaxezê nehat.Qelem bê deng bû.Serê xu bilind kir.

Çavên wî ketine dû pelên geş.Her zû carekadî serê xu şor kir.

Kenîya xeçê,livîn û çivêlyên wê,diserîda wek fîlmekê reş û sipî kar dikir.

Bê deng bû,neliv ma,dinav hizirkirneka kur da berze bû.Gelek bîrkirin.Gelek

wesa ma.Divîya hizirên wî tinê bû mawê çend çirkeka bibine rastî.

Careka dî çepekê lixo bidit.Xo jibêrîvana vedizit.Libin wê darberoya

hercar.xecê bikite dinav sîngê xoda.tijî sîhên xo bêhna memkên wê bikit.

Yan bila erd şeq bibit û dinavda biçite xwarê.

Gelek ma.Ne xecê hat û ne erd şeq bû û ne ew çavên şîn jiçavên wî yên

wastîyay vebûn!

- Ez....Ez Mam digel wan.Bûme pêşmerge.Em dikêm bûn.Karekê giran liser

milên mebû.Em toşî gelek şer û pêkdadana bûn.

Min rolê xu bimêrane dinav hevalanda dîyar kir.Ez bûme xoşmêrê şoreşê.

Serê xu bilind kir,çavên wê yên dinav pirça zerda berze bûyin.Ya şivtana

liteniştên qelemê xu didit.

- Jiber zîrekî û mêranyên min.Hevala navê min kire şêr...

Berê xu da xudana pirçê,ka bawer jê kî yan ne...!

Xodana pirçê tinê awrîyek dayê û zifirî şerê qelem û kaxezê.

- Nav ü dengê min belav bûn.Ez bûme şêr. Kesê ne gote min reşu,yan reşku.Reşu û reşku mirin.Heta min bixu jî navê xu yê dirust jibîrkir.

Wek bêhnvedanekê da xu.Her weku divîya tiştekî bînte bîra xu..

6

- Rojekê rêya me digondê me ket.Min xu jihevala dûr kir.Ez çom ser kanîya

gondî.Cihê jivanên min ü xecê.Ez Mam lihîvîya xecê min zanî dê her êt.Dê her

bînim.

Mirada min hasil bû,kenîya xecê jidûr hat. Dengê wê,kenîya wê,jîya hemü kiçan coda bû.

Min xu dirêya wêda veşart.Heta delîve ketyê. min destê wê girt û bire pişt

tiraşekê.Keyifa wê gelek hat,xu dinav sîngê minda heland.

Em bûne êk leş.

Heval lihîvîya min bûn.Wê nehêla ez bigehime hevalan.

Got yan mirin yan ez jî dê digel hewe êm.

Min divîya wê êvarê xecê birevînim.Lê heval razî nebûn.Gotin em dê xwazin,heker babê wê razî nebû,ya hewe bivêt wê bikin.

Me karê xu wê şevê hêla û em man ligondî. Me xecê jibabê wê xwast.

Keyifa babê wê gelek hat.Jiber ez pismamê wê me û mêrxasekê binav ü

dengbûm.

Tilên xo têkraçandin..

- Ez dirêj nakim.Lidemekê nêzîk,em bûne bûk ü zava.Jîyaneka xoş û pirî hîvî û

omêd liberahîya me bû.

Ez diçûm karê xu digel hevala.xecê dima lihîvîya min.Lirojên bêhnvedanê me

ligondî dibûran din.digel heval û kes karên xo.

Piştî salekê,ez bûm babê evînê.

Kiçeka ciwan û şirîn jidû evîndaran.

Ew kiç bû hemû jîyana min,gelek rengê dayika xu xecê dida..

Dîsan xudana çava deng jiqelemê xu îna. Bidû çavên tijî pirsîyar çavzlkanê

digel çavên wî yên jixewê xerîb kirin!

Serê xu şor kir,bersiva pirsîyarên wê hate dan.

- Lisala duwê,ez bûme babê kiçeka dî.

Me navê wê kire jîyan.

Likamlana biharê hate ser dinîyayê.Jîyana me kire bihareka xemilandî..

Çîroka min gelek dirêje,dê serê te lê bite êş.

Ez dê kurt kim..

Awrîyek dayê û zû zifirî karê xu.

- Piştî gelek şer ü pêkdadanan digel dojmnî.

Ez bisextî birîndar bûm.

Jiber seruberê şoreşê û nebûna derman û dixituran.Ez hinartme dervey welatî.

Biharîkarîya şoreşê,ez hatime elmanîya.Liberlîn ketime xesteka taybet.

7

Piştî demekê dirêj,ez sax bûm.Lê bûme nîve mirov.Min neşîya çu kara bikim.Min neşîya vegerm nav şoreşê.Destê min seqet bû.

Ez neçar bûm,li elmanîya daxwaza mavê penaberyê bikim.

Piştî dû salan,ez wek penaberek sîyasî hatim wergirtin.

Gelek pê çû heta min şîyay xecê û herdû kiçên xu,evîn û jîyanê bînime elmanîya..

Lê piştî gehiştîn.Dîsan em ketin dixoşîyeka mezinda.Dîsan evîna me nû bû,dîsan em bûne aşiq.

Lê jîyana gondê me yê,Dizikê gelîyekê asê û jibîrkirîda.Libin top û firokên dûsê

dojmnanda. Pirs û tirs û bê karî.Jigondekê bê rê û kareb xwandingeh.Ligondekê çend malên hejar.

Êkser.piştî çend Rojeka,em liberlînê,li nav mirovayetî û pêşketina bê dawî hişîyar bûn....

Me neşîya bawer bikin.Me ne dizanî hindek mirov dijîyaneka wesa xoş da dijîn?!Me dinîya ne dîtibû.

Min hindek gond û bajêr dîtibûn.Lê xecê ji gondê me zêdetir nedîtibû..

Erê....Jigondekê libinê çîyayekê asê,dûr ji hemû pêşketin û mirovayetyê.Em

bûne xelkê berlînê.

Tû baş cîyawazîya em ketînê dizanî!

Em hêr kirin.Em ketin dizifirokeka dijwarda.

Zimanekê coda.Mirovên coda.Seqayekê coda.

Hemû tişt dicoda bûn.Me her nedizanî ku cihek hosa coda lidunîyayê heye!

Min şîya xu liber bigirim.Min pê lidilê xuna.Min xu jixoşîya dûr kir.Min şîya xu.

Lê..xecê her zû destên xo bilind kirin.Bû êxsîra xoşî û pêşketinê.Xu liber

negirt.Kevilê xo gohart.Xu berda dinav pêla bileza pêşketinêda.Piştê demekê

kêm wek elmana serederî dikir.Çavlêkirinema kore dikir.

Herzû jimin dûr ket.Jiber jîyê wê yê biçûk.Û mejyê wê yê zelal.

Zû kete ser rêyekê.Birîyar da,xu jibinîyatî bigohurt.Bibite miroveka dî.

Bibite elman.Gelek hewil dan min jî bigohurt. Kerestê min yê req bû.Neşîya.Ez

hêlam,xu biminve newastand.

Kiçên wê dibiçûk bûn.Her zû hatine ser rêya wê.Hemû jimin dûr ketin.Ez

Mame bitinê.

Her zû fêrî ziman û karî bûn.Ez hêlam liber malê.Jiber destê min yê seqet.Min

ne şîya cu karan bikim.

Ez bûme zelamê ber malê..

Lisalên êkê û duwê jihatina xecê.berî jimin dûr kevit,dû kur peyda bûn.Welat û

Kawe.

8

Pştî xecê didinîyayê gehiştî.Ez diwê negehiştim Ew dimin negehişt.Em jêk dûr

ketin. Peywendîya me sist bû.

Taybet piştî xu jibçûka xilas kirî.

Birîyar da biçûka nebit.Jîyana xu wek wê divêt birêve bibit.Tiv kire pişt xo,tiv

kire wan rojîn birs ü tirs û dûr ji cîhangeryê tiv kire wan rojên jijîyê wê bûrîn.

Wek wê digot,jîyana min ji evro dest pêdikit.

Ez kiça evro me.Ez evro jidayik bûyme..

Min neşîya jibirîyara wê lêve bikim.Min çu desthelat liser nema.

Rojekê bêy min çû dixitorî û xu jibçûka xilas kir.

Hate mal,digel kiçên xu ahengek danan. Keyifa wê gelek hat.

Jiwê rojê,arêşên me dest pê kirin.Em bûne neyar.Min nevîya çavên min

biçavên wê bikevin.Bû wê her ne xem bû.Çu tişt bû wê ne xem bûn.Ez liber dilî

reş bibûm.Pîte bimin ne dikir.Diçû karî û dihat.pare dimezaxtin,kirîn û bazar

dikirin.Her nedizanî ka ez Heme yan ne.

Ez dimalêda bibûme pîvazeka rizî..

Serê xu şor kir.Dûsê rondik jiçava jorda dinav rîhên wîda berzebûn.

- Kiçên xo wek xu vêrkirin.Mal jidest min derket. Hemû tişt jidest min

derketin.Tinê min mavê xwarin û nivistinê man.

Herdemê min xu nerazî dikir,digot.Rûne ser kurîya xu.Ez yate xodan

dikim.Heker ne bidilê te ye.Keremke wêhe dergehe?!

Çu mêranî jimin nedihat.Yasa û polîs digel wêne.Kiçên wê digel wêne.Kur weku wêne. Tinê ez yê cûdame.Divêt razî bim yan derkevim.

Wastîya.Devê wî hişik bû,destê xu havête perdaxa avê.Dengê gewirîya wî tijî

jor bû. Qelem kete ser kaxezê.

Piştî bêhinvedaneka kurt.Çavzlkanê dest pê kir.

Ew çavên sorên tijî xew û xem.Ketin wan çavên şîn yên tijî hîvî û jîyan.

Lêva huçkê xu disimbêlên xu husîn.Serê xu şor kir..

**

Dengê firokên şerî jiçîyayê gare biser ket.

Deng nêzîkÎ cihê wan bûn.Heval bijale bûn. Her êkî xu havête pişt berekî.Berê

çekên xu dane esman..

- Şêru xu veşêre..

Dinav gîyayê biharêda,kete ser teniştê..

- Ew jihndê kêm tirin ez xu jiber wan veşêrim. Heker mêrin bila peya bin.

Deng jidevê çekê wî hat.Dukêl jibinê firokê derket.Li esmana bû gumtilekê

agirî û jorda parçên wê hatine xwarê...

Tijî gelî tilîlî û hewarên hevala bû.

9

- Dest xuş şêru...Her bijît şêruu.....

**

Kaxez livî...Qelem kuxî...

Şêru kete beranberî rastîyeka tal.

Destên xu têk husîn,serê xu Xurand,cihê xu xoş kir.Çu gihurîn neketine cihî.Çavên şîn her dizîq bûn.Qelem wek tajyê nêçîrê lihîvîya fîta wî bû.

- Ez ketime ber destên xecê û kiçên wê.

Min çu nema bû bijîm.Tinê min mafê hindek para hebû jibû cigare û çayxanên

min.

Ew jî roj bû rojê kêm dikirin.

Digût çigara ne kêşe dixirabin.Gelek ne çe çayxanê,hevalînîya püça

neke,hevalînîya kurda neke.

Xecê sipêdê diçû karî,gelek çaran bişev jî ne dihate mal.

Dema min pirsîyara karê wê dikir,yan ka likîve bû?!

Digût.Ew ne mavê te ye.Tinê heker parên te neman.Hingê daxwaza hindek

para bike.Û mayê xu dikarên meda ne ke.Tezanî?

Bêhinvedanek daxu.Her weku dideftera hizirên xu da litiştekî digert...

- Evînê zû şû kir.Ez jê tena bûm.Herçende mêrê wê ne bidilê min bû.Min

nedizanî ka çi kese? Ka çi dîne?Ka çi rabirdû heye?

Tinê xecê razî kir û digel çû!

Jîyan wek dayika xû ye.Heta axivtin û cil ü lêkdan û rêveçûn.

Min çu jikarê wê nedizanî.Gelek caran sê çar şev û rojan ne dihate mal.Min

pirsîyar dikir. kesê rastî bû min nedigût.

Tinê xecê digût,karê wê hindê dixwazit.Bela xu jê ve ke.

Herdû kur biserê xu ketin.Fêrî cigare û gelek şaşyên vî welatî bûn.

Gelek caran bêhina min teng dibû,min gazinde dikirin.

Xecê bersîngê min digirt..

- Bela xu jibiçûkên min veke.Bila bû xu bijîn. Bila wek te ne bine golik...

Jor bê deng bû,qelem girêl bû ser sîngê kaxezê.Kaxez dibin peyvên giranda

wastîyan. Perdaxên avê vala bûn.

Deng jidergehî hat.Dû polîsan milên wî girtin. Lipêş wan çavên şîn kelamçe

dizendên wî girêdan.

Heta berdergehî lidûyif çû.Bikenîyeka şirîn, xatir jê xwast...

2 –

10

Dergeh lipşt hate girtin.Kete ser cihê xu.Serê xu dana ser Balîfka sar.Pîte

bikesê nekir.Silav nekire hevala.Bersiva çu pirsîyaran neda. Hevala derdê wî

dizanî.Hêlan bû hizir û xeman.Berze bû,kete zifiroka leşê wastîyay û hizirên

şêlî.

Geh xav bûn.Xew har bû.Cih ker bû.

Xecê jigondî beref mexelê pezî hat.Kirasê xu yê gulgulî,jikelem û kêrata

vedikir.Diber ra bejna xu diçemande kulîlik û davên gîyay. Dikirine destik û

bidengê xu yê mê.Gehên mêranîya wî di azirandin..

- Lulu pismamû dutmama te me.

- Bu xelkî binexitim bute biherwe me..

Destkê kulîlka didesitîda,dû sê kitek dahêlane diber perçema xura.

Biserê tilên xu pirça xu ya reş û dirêj şe kir.

Berî silav kite pismamê şivan.Lêva kirasê xu ji ber doxîna xu berda xwarê.Lewendiyên xu liser milên xu şidandin.Dû sê cara pişkurî,lêvên xu kezandin...

- Êvar baş pismam...

Xwîna dilê wî bû volkan.Çend qirêja digehên wîda digel pêlên xu yên dijwar

birine dilî...

Bêî bersivê bidit.Rünişte ser berekî libin sîbera darmazîya.

Çav digel çavan axivtin.Dest digel destan, heta gera lêva hatî.

Rewîna seyê gewir,jidavên xoşyê rizgar kirin. Rabûn ser pîya,xu dûrî êk kirin.

- Eve bipirîvan hatin...!

- Bila bên Mame çi kirîye...?!

- Bila me digel êk ne bînin.

- Ne tirse..Tû bû minî û ez bû teme..

- Raste.. Lê...?

- Lê çi? Ha..?

- Here dûr keve.Bila kes me husa nebînit.

- Ez jikesê natirsim.Lê jiber xatir çavên te eve ez çûme dûr.

- Dê here zûbe eve hatin..

Deng jidergehî hat.

Dû polîsa milên wî girtin.Kelamçe kirine zenda, beref cihekê dî birin..

— 3 -

Liser kursîka her car rünişt.Destên wî ji kelamça azad kirin.

11

Xwarina sipêdê danane ber sîngî.Dergeh lipşt girtin.

Jor bê deng bû,xudana çavên şîn nehat. Çavên xu lihemû kun û qolaçên jorê

kêran, her weku eve cara êkê ye vê jorê dibînit.

Hindek ava tezî berda gewirîya xu ya hişik.

Ma lihîvîya xudana pirça zer.Dû sê caran lidûr xu zifirî,kes nedît.

Rabû ser pîya,linîva jora mezin hat ü çu..

Hest bazadyê kir.Xu jêk vekêşa,tijî sîhên wî oksîcîna paqij bûn.Hest bibirsê

kir.Lixwarina xu zifirî,her jipîyave çend parîyek xwarin.Tameka taybet jê hat.

Xwarina xecê hate bîra.

Roja êkî xecê xwarin bû dirust kirî.hind xwar heta bersojê girtî.Dû roja nesax

bû.

Liser kursîkê rünişt.Çavzlkanê digel perdaxa avê kir.Melay digût,herame mirov

avê biperdaxa vexut.Perdax bû aêraqê yên dirust kirîn.

Dergeh vebû.Bejneka bilind,dû çavên şîn, pirçeka zêrîn hate jor.

Tijî ber sîngê wê yê mê,kaxezin.Barana kenî û bişkurînê jidevî dibart.Hîvî û

umêd ji çava dizên.

Ew jora mirî û bê deng,tijî livîn û jîyan bû.

Kaxez danane ser mêza dinavbera wanda, liser kursîka xu rünişt.

Tila şehdê dana ser dukma kumputerî.Ma lihîvyê heta geş bûy.

Dû sê awiryên tijî hîvî danê.dest da dû sê ekta vekirin çend serqelemek

nivêsîn.Carekadî danane cihê wan.Ekteka sor jê girt liber sîngê xu

vekir,qelemê reş jiçanta xu ya hercar rengek,wek rengê çilkên wê îna

der.Havête ser kelexê wan kaxezên dinav wê ekta sorda.

Perdax tijî av kir,dûsê qorç lêdan.Carekadî, perdax dana ser lêva mêzê.Lêvên

xu yên ter, bipirteka kilînsê zuha kirin.

Tilên zirav bezîne gerdena qelemî.Şer bidû çavên tijî pirsîyar,digel dêmê wî yê

rengê mirîya dida kir.

Jor bê deng bû.Serê xu şor kir,çavên xu neqandin.Nezanî dê çewa dest

baxivtinê kit? Nezanî dê çi bêjit?

Hemû tişt jibîr kirin.Mejyê wî bû kaxezeka sipî.

Wek diza çavên xu vekirin.Hêşta dû pelên geş agirê jê dipeşt.

Serê xu xurand,yarî bitilên xu kirin,cihê xu xoş kir,kuxî,lidur xu zifirî.Gelek

hewlên xumjûlkirinê bikarînan.Neşîya wan çavên wek derê dû çeka stêrka xu li

enîya wî girtîn,dûr bêxt.

Neçar bû deng jigewirîya xu îna..

- Wek min gotî.Xecê û kiçên xu,pîte bimin nekirin.Ez ji jîyana wan

derketim.Tinê xwarin û nivistin min liwê malê man.

12

Xwarin digel min nedixwarin.Min bermaya wan dixwar.Nivistina min jî ya cûda

bû.Ez lijora mêvanan dinivistim.

Dilê wan jimin reş dibû.Digotin dema tû xwarinê dixûy,deng jidevê te diêt.Dilê

me reş dikî.

Her cenide,lidû sê roja carekê limal xwarin amade dikirin.Her xwarina wan

liderê bû.

Hizireka giran serê wî şor kir..

- Ew demek dirêj bû xecê ez jijora nivistina xu kirbûme der.Digel min

nedinivist.

Digot.Tû linik min nanivî..Tû bişev xirxirê dikî.Te xew limin heram kir...!

Jin û mêratîya me tinê wêne bû.Ew wêne jî roj bû rojê dihejîya.

Min gelek xu ragirt,min gelek xu asê kir.

Cigare û telefzîwnê,neşîyan demê min yê bê kar û xemên min yên giran sist

kin!

Ez litiştekî dî gerîyam.Ez lixomjül kirinekê gerîyam.da demê xu pê bikujim.Da

xemên xu pê sist bikim.

Ez fêrî vexwarinên kihulî bûm.Ez û şuşa aêraqê bûne heval,bûne evîndar.Min

neşîya jê dûr kevim.Wê jî ez digel hindek hevala dame nîyasîn.Em her roj

êvara dinav baxçekî yan liber lêva cadekê kum dibûn.Hevalînîya wan, gelek

jixemên min sist kirin.Min hemû tişt jibîr kirin.Mal bû min wek hotêlê lê

hat.Dema min nevîyaba biçime mal.Berdîwarekî hîvî ji min dikirin.

Lê... Lê...

Bê deng bû,serê xu kire dinav destên xuda. Enîya xu perxand...

Xudana çavên şîn.Qelem dana ser kaxezê.Dû qorç lavê dan,bêy çavên xu ji

enîya wî vekit!

- Ne wan hevala û ne wê şuşa aêraqê şîyan kenîya xecê ji serê min bînne der.

Dengê wî nizim bû,serê wî şor bû...

- Erê..Min neşîya xecê jibîr bikim.

Tilîlyên kenîya wê tijî nav wan dar mazîya bûn. Lirexê dî yê gelî deng vedida.

Dengê girîya kiçên wî,kenîya wan,yaryên wan.Bişkurîna herdû kuran.Kenî û

çivêlyên wan.Wek fîlmekî,lipêş çava kardikir.

- Erê..Min neşîya xecê jibîr bikim.Min neşîya biçûkên xu jibîr bikim.

Min neşîya xu jimal dûr bikim.Ez pêtivî mala xu bûm.Ez pêtivî jinekê bûm.Ez

pêtivî xecê bûm. Min divîya biçûkên xu bibînim.Min divîya digel wan

rûnim,digel wan baxivim.Min divîya bêhin kime xuha leşê wan.Min divîya

bizanim ka çi dikit?Çi dixûn?Çewa dijîn?Digel kê digerin?

13

Min divîya paşeroja wan bizanim.Min divîya biçûkên min ji yên dunîyayê

hemûyê baştir bin.

Serê wî giran bû,şor bû nav mila.

Axînkek rahêla.Vê carê herdû çavên şîn, ketine tura xemên wî yên giran.Lez

liqelemî kir. da êş û janên wî liser kaxeza sipî bidestên xu yên nazik kum kite

ber sînkê wî yê tijî kuvan.

Dengê kaxezê tijî kun ü qulaçên mejyê wî bûn. Çirîsk ji sersimên qelemî

dipeşîn.

Serê xu bilind kir,hêşta xudana pirça zer û çavên şîn.Ya qamçîya liteniştên

qelemê şemboz didit.

Zanî ya wasitîyaye,xemên wî,rengê rûyên wê jî yên zer kirîn.

Perdaxa avê bilind kire ber çavên xu,çavên wê pitir nêzîkî wî bûn.Divîya lêvên

wê yên rengê hingivînî bibînit.Jiber pirça wê ya belav, çu xoşî jê nedît.

Dû qorç lavê dan,dengek bilind jigewrîya wî ya hişik hat.Pişta destê xu didevê

xu husî.

Vê carê ew lihîvîya xudana çava ma..

Qelem dirêj bû nîva kaxezê,ew tilên nazikên ji givaştina qelemî sor bûyin.Bezîne bejna perdaxa avê û bilind kire wan lêvên nazig.

Lêv ter bûn.Çavzlkanê dest pê kir.Jor bê deng bû.

Berî xew lidlê wî bibite mêvan,til bezîne qelemî,deng jikaxeza hat.

- Roj bû rojê ez jimal dûr ketim.Peywendîya min bibiçûkên min nema.

Min rengê wan jibîr kir.Ez gelek tengav bûm, ez nesax bûm,min neşîya xu xudan kim.

Berê xu da wê xaça bidîwarê jorêve.

Xwîn ya jibirînên îsa pêxember dizêt.Kes derman nakit.Kes bû nagirît.Kes derdê wî nizanit.Hemû pesna mêranî û bêhin firehîya wî dikin.Hemû wek mînak bû jîyana xu didanin. Kesê nevêt bibite îsa yê xaçkirî.Hemûya divên bibine îsayê pêxember.

- Min birîyar da bizifirme mal...

Jor bê deng bû.Tinê deng jididanên qelmî dihat!

- Erê...Min birîyarda bizifirme mal.Bila kes pîte bimin nekit,bila ez bermayîka

biçûkên xu bixûm.Bila ez lijora mêvana binivim.Bila wek seyekî serederyê digel min bikin...!

Çavên xu neqandin,divîya binivit.

- Ez çû me mal...

Ma lihîvîya xudana pirçê,zanî hest biderdê wî ne kir.

- Xecê dergeh vekir.Navçavên wê bûne girê!

14

Enîya xudana çava jî bû girê.Hest birwîdaneka mezin kir.

- Ez çûme jor.Avek û kupek çayê bû min înan. Min hizir kir,dilê dutmama min

bimin sot.Dê ji min razî bit,dê limin burt.Dê bêjite min tû bû na êye mala xu?Tû

bû na êye nav biçûkên xû?

Tilên xu têk husîn.Pirça xu biwan tila şe kirin.

- Piştî demekî kêm.Hêşta min ça xu venexwarî. Hêşta lêvên min ji ava wê diterbûn.

Dû polîsa hildane jor.

Xudana pirçê serê xu bilind kir.Dengê zincîra ji gulaliyên wê hat.

- Min zanî polîs bihayê wê ça û wê perdaxa avê bûn.

Xecê hemû tişt amade kiribûn.Polîs agadar kiribûn.Pîtivî çu suhbet û berevanîya nebû.

Êkser kaxezeka amade,danane ber sîngê min û liser min sepandin.ez xecê berdim.

Çavên wî ketine çavên wê yên şîn.Hest bidil pêvebûna wê nekir.

- çu jimin nehat.Min neşîya xecê razî kim.Ez necar bûm.Min xecê berda!

Jor ker bû.Qelem bibê dengî liser kaxezê kardikir.Kaxez bû avirmuş dibin didanên qelemî ve.

- Erê...Min xecê berda!Min liser birîyara mirina xu îmza kir.Min îmza kir ez

nêzîkî mala xecê nebim.ez nêzîkî biçûkên wê nebim.ez mayê xu dijîyana wan

da nekim...

Serê xu bilind kir,çu gihurîn ne ketîye dêmê xudana pirçê.

Xudana pirçê,wek pilingeka mê bidûv xezaleka küvî dibezit.

Her çendekê awirîyekê diditê û bilez dizifirte nêçîra xu.

- Dibit livî welatî,dinav xelkê vî welatî da berdan tiştekê asayî bit?!Dibit rewşit û

tîtalên xelkê van welatan.berdanê bikêmasî nezanin?!

Em dibêjin..Hevit cara ya revandî be,neku carekê ya berdayî be...

Berdan..Anku mirin!Mirin gelek jiberdanê bû min baştire.

Peyva mirinê serê xudana çava jinav wê pirça zer û wan kaxezên belav îna

der. Bêhinvedanek da til û qelemê xu.

Çav her man wek sîxorekê wefadar,li enîya wî ya girê û çavên wî yên

wasitîyay!

Neşîyan xu liber stêrka çavên wê bigirt.

- Xecê hemû tiştên min bû.Xecê jin û heval û dayik û bira û kiç û kur... Û ü

Dengê giryê jigewirîya wî derket.

- Berdana wê,birîyara mirina min bû.Dawiya jîyana min bû.Min jîyan nema.

Ez dê jibû çi jîm?Dê bû kê jîm?Ez lihîvîya çi me?

15

Kesê persiva min neda?

Polîsekî milê min girt.Ez birime derê.Got eve nav ü nîşanên cihekî

taybetin,xwarin ü nivistin bibê beranberin.Tû dişyê lê bijî heta tû bû xu cihekî

baştir bibînî.Tû ü ev male ü ev biçûke ü ev jine jêk xilas.Nabit tû mayê xu

dijîyana wanda bikî.

Heker tû neyê razî,tû dişêy birêya parêzerekî dawayê lidadgehê

tumarbkî.Dadgeh dê birîyarê liser dit.Heta wî demî,xu jivî cihî û vê malê dûr

bêxe!

Raste ew demekê dirêj bû min peywendî digel xecê nemabûn!

Raste ew demekê dirêj bû min biçûkên xe nedîtibûn!

Raste ez dijîyana wanda nemabûm!Raste ez wek mêvan limala xu da dijîyam!

Raste min çi kartêkirin û biha limala xu nema bû.

Lê...Berdana xecê.Û dûr kirina min bizurî ji mala min.Ez hêr kirim.Ez jidil ü

gîyan hejandim. Ez ketim beranberî rastîyeka dijwar!

Bê xudan û rûreş.Dîsan Mame bitinê.Min hest bixerîbîyeka dijwar kir.Ez bûme

benîştê devê hevala berî nehezan.

Her weku ez wê rojê hatîme vî welatî.Ketime kempeka bê seruber.Mêvanên

wê hemû nîve mirov û nesax û xudan karesat bûn.Hemû dibê xudan bûn!

Min hest kir ez ne yê bitinê me.Gelek ji min xiraptir hene!

Ez ketime dijoreka biçûkda digel pîremêrekê nesax.Derdudermanên wî araq û

dermanên bêhoşyê bûn.Şev ü roja ageh jixu nebû. Nedizanî ka çi dixut?Likîve

dinivit,likîve dimîzit?!

Xwarin û nivîstin û mîztin û hemû tiştên wî liser textê wî bû.Bêhna mirarî ji cihê

wî dihat.

Her ji roja êkê ez ketîme wê jorê digel wî pîremêrî.Min birîyarda xu asê

bikim.Wek wî pîremêrî lixu nekim.Nekevme bin pîya,bû kesê ne bime bela.

Her wê êvarê min cigare hêlan.

Min vexwarinên dijwar hêlan.Min daxwaza dixiturekî taybet kir û dest

biçareseryê kir.

Her zû ez hatime ser hişên xu.Ez likarekî gerîyam,min jidil vîya kar bikim..

Berê xu da xudana çava,divîya sund bixot ev axivtine dirastin!

Xudana çava şerê wê û qelem û kaxezê yê dijwar bû.

- Ez dirêj nakim.Min xu guhart.Ez bûme mirovekê dî.Ez bû me xudan kar û

heval û pare..

Hevala gelek harî min kirin.Ez dibirme karên bisanahî û sivik.

Jîyana min gelek xoş bû.Min joreka biçûk bû xu girt.Ez Mam bitinê,ez azad

bûm.Bidilê xu ketim.

16

Parêt min dikêm bûn.Lê têra min dikirin. Taybet piştî min cigare û hemû vexwarinên kihulî hêlayin.

Ez ketime ser karekî bisanahî.Belav kirina rêkilam û rojnaman.Ü bişev digel hindek hevala diçûme karê paqijkirina xwaringehekê. Min demê xu bisanahî dibûrand.Ez tena bûm.

Çavên xu neqandin.Nevîya kes rastîya awirên wî bizanit..

- Min xecê û bîrhatinên wê jibîrkirin.Min dinîya û xemên wê jibîr kirin.Min ageh jikesê nema.

Ez bû roja xu jîyam.

Serê wî giran bû,çavên xu perxandin.Xew tijî bîbilkên çavên wî bû.Bawşek jinîva gewirîya wî deriket.

Xudana pirçê,qelem dana ser kaxeza.Destê xu havête perdaxa avê.

Bîra wî jî îna,wî jî perdax bilind kire ser devê xu, dengê gewirîya wî tijî jor bû.

Zanî gotinên xecê dirast bûn.

- Tû dilê mirovî ji avê reş dikî..Tû xu nizanî avê jî wek mirova vexûy!Dê kengî bîye mirov...?

Perdaxa vala dana ser mêzê.Berî simbêlên xu zoha kit.Dû polîs hatine hindav

serî,milên wî girtin,kelamçe kirine zenda.

Bikenîka zer,xatira xu ji xudan pirça zer xwast.

Kelek pê nexoş dibû.gelek pê diherşî.Dema lipêş wan çavên şîn.Kelamçe dikine zendên wî yên berevanî bê ji welatekî dikir.

Gelek dergeh lipşt hatine girtin.Digelek kun ü qolaçan ra birin.

Liser cihê xu yê sar.Kete ser piştê.Çavên wî mane hilawîstî bibanê wê jora biçûk ü tarî ve.

Heval baş dizanin,nihu bersiva çu pirsîyara nadit.Silav nakite kesê.Divêt bû

demekê dirêj digel xu bimînit,digel gîyanê xu aşit bibit.

Ew bixu dê ête nav wan,dê birisî bit,dê têhinî bit,dê wastyêt.Dê hemû nihênyên

xu kete ser berka wan...

Xew har bû,leşê wastîyay dagîr kir.Xirxira wî tijî jor bû...

4 –

Gondîya,digel çend hevalên wî yên şoreşê. Yê kirîne dinîva xuda.

Mela û muxtar û dû şahid yên lihndav serî.

Milê wî girtin jinav hevala birine derê.

Çend ayat û pistpst jidevê Melay derketin.

17

Hemûya pêk ve destên xu bilind kirin.

Fatîhe liser wê birîyarê xwandin.

Tilîlî ji dû sê gewiryên nesax derket...

Ne dehol û zirna.û ne stiranbêj û mezîkin.

Dest qotan,ji hindek destên jiber merbêr û karê xunelukî bûyin dihat.digel

hindek peyvên filiklorî ji gewiryên nêr derdiketin...

Hemû bilez bûn.Xwarin gîro bû.Ew mêvanên nîveka jyê xo birsî

bûrandîn.Ketine ser kelexê wî beranê xalê wî ser jê kirî û diqazaneka mezinda

baş kelandî...

Ew yê bilez bû.Bejna bilind,çavên reş,pirça dirêj libenda wî bû.

Mêvan dipirsî bûn.Binê amanan alîstin.

Ew yê bilez bû.Xecê ditirsîya.

Mêvana daxwaza çayê kirin...

Ew yê bilez bû.Xecê ya bilez bû.

Pîremêrekî bê kar.Çîroka xanê lep zêrîn vedigêra...

Ça vexwarin.

Ew yê bilez bû.Xecê lihîvîya wî şir bû.

Jor tijî dükêla cigarên tûtinê bû.Tijî keliştên dîwaran,mêranî û direw bûn.

Xew jigondî dûr ket.

Ew yê bilez bû,xecê wastîya.

Mêvanên bêkar.daxwaza kûz ü mêwîjan kirin.

Wî pîremêrê dû geza jigondî wêve ne dîtî. Çîrokên mêranyên xu vedigêran.

Ew yê bilez bû.Xecê bê hîvî bû.

Kesê nedivîya biçite mala xu ya sar.Kesê nedivîya wê dîwana têr û wê

sohbeta xoş jidest bidit.

Şevên hosa her çend salan carekê dihelkevin. Kes xu gorî zavay nakit.Kes xoşîya xu nadite bixoşîya zavay.Dibit ev şeve dûbare nebit? Dibit eve xoşîya

dawiyê bit.Hemûya xu şir kirin.

Gond ker bû.Biçûk ü nesax wastîyan.Xewê leşê wan dagîrkir.

Pîremêr û aşiqan dane berêk.Mêvana xew jibîr kirin.Eve jidespêka şoreşê ew

têr ne nivisitîne, ew û xew nehevalin.Wan xew ya jibîr kirîn.

Ew tengav bû,dilê xecê yê jar bû êxsîrê xewê.

Kesê ageh ji agirê dilê wî nema.

Ça dubare vexwarin.Goz xilas bûn.Mêwîj neman.Çîrok û serhatî hatine vecûn.

Dîklê gondî jiber pişîkekê revî ser lêva govekê. Libnê dinîyayê ronahîyek

dît.Perêt xu dane bay û bidengekê bilind bang da...

18

Cilvek bimêvana ket.Muxtar jinav hizir ü xewa hişîyar kir. Devê xu bire bin gohê birazavay.

- Biburin.Divêt zava biçite ser cihê xu...

Milên wî girtin.Herweku dê revit.Birazavay devê xu bire bin gohê wî,pistpstek

bû kir,kete pêşîya wan.Beref wê jora biçûk ya ji axê û çilî dirost kirî birin.

Sersipî jixew hişîyar kirin.Xecê jinav tirs û hizra rizgar kirin.

Navê xudê îna,lipşt xu dergehê tenekê girt. Xecê jipêşve rabû.Pirça wê,wek

ebayekê reş nîva bejna wê girtibû.

Ketine beranberî êk.Çavên wan gelek peyv gotin.Gelek bîrhatin liser dêmê

wan hatine nexşandin.

Destên wê girtin.Kêşa nav sîngê xu.Dinav zendên xuda givaşt.Tijî mejyê wî

bêhna xena pirça wê bû.

Dest da wê fanusa bidîwarîve hilawîstî,kêm kir. Jor tarî bû,xecê pişta xu

dayê,rûyên wê dibin hîzarê ve ji şerma sor bûn.

Lipşt rawestîya,milên wê perxandin,hîzara wê rakir,lewendiyên wê vekirin.

Berî kuxka birazavay pête goha.Mirada xu bicih îna.

Ketine ser piştê,dû leşên rûs,yarî bitilên êk kirin.

Liser milê xu zivirî.Devê xu havête gerdena wê ya zirav,divîya bibite nava dû

hinaran.

Dengê firokên sîxoyê jikuxika birazavay hat.

Karê xu kir.Divîya dergehî libirazavay vekit.

Dû polîs lihindav serî dirawestîyay bûn.

Milên wî girtin.Kelamçe kirine zenda ü birin...

5 –

Hêşta tijî çava xew bû,hêşta tijî difina bêhna xoha leşê xecê bû,hêşta tijî goha

dengê mêvanên şivêdî bû.

Liser kursîka her car ronişt.Kelamçe jizenda vekirin.Dergeh lipşt girtin.

Lidûr xu zifirî,her weku eve cara êkê ye,wê jora mezin dibînit.

Çavên xu perxandin.Xew jê daqota.Dûsê qoriç liwê ava tezî dan.Zanî av gehişte binê gîjan rüvîkê.

Tezîyatîya avê,xew revand,hizirên wî cemandin.

Liser kursîkê,xu jêk kêşa,qirênî kete perasyên wî.

19

Dergehê biçûk vebû,xudana pirçê bidevekê tijî hîvî û bişkurîn,kete beranberî

dêmê wî yê pêtî.

Ew kuma kaxez û ektên liber sînkê wê yê har. havêtine ser mêzê.Piştî

ronişti,memkên wê hêdî hêdî zifirîn ser siroştê xu yê mê.

Gelek cara divîya bêjitê.Zehmetî wan memka nede.Ez dê êm harî te wan

kaxez ü ekta hilgirim.Tinê bila karê te xudankirina wan memka bit.Çu karên dî

neke.Lê ew ceger nebû.Ew jî bû kul ü ma didilî da.

Axîngên kursîkê dibin qonên wê yên xir da.

Jiwê zifirukê qortal kir.

Çavên wî man liçavên wê.Dû til likumputerî dan.Perdaxa avê bilind kire lêvên

xu.

Zû zifirande cihê wê.Ekta hercar jinav kuma ekte ü kaxezan jê girt.

Ekte vekir,çend laper ladan.lichekî vala gerîya.Qelem jiçantê xu îna der,kire

dinav sê tilên nazik da.

Bisedan pirsîyar jiçavên wê yên şîn libenda bersiva zîq man.....

Cihê xu xoş kir.Tilên wî bilivîneka tirsnuk,yarî bipirça wî ya şepirze kirin.

Tiva xu daura.Serê ezmanê xu yê ter,dilêvên xu yên hişik û zuha hosîn.Bêhna

wî bizehmet biser diket.Dengekê şêlî ji gewirîya wî derket.

- Ez nizanim,ev suhbeta heta nihu min bûte kirî. tû çend bawer dikî?

Ez nizanim,ka te çi merem pê heye?

Ez nizanim,ev elmanîya ez dizanim têra te heye?

Ez nizanim,ka ez dişêm hemû xem û kuvanên xu bigehînme te?

Ez nizanim,te çi jimin divêt...?

Berê xu da navçavên wê.Ya mijûl bû binivêsînê ve.Pîte biaxivtinên wî nekirî

ye.

- Lidestpêka van rûniştinên seyir.Te gûte min, min divêt harî te bikim.Jîyanê

liber dilê te şirîn bikim....

Serê xu jinav kuma kaxezan înader.

- ü min gûte te.bihêle ez bimirim.Min harîkarîya te nevêt!

Şerê çavzlkanê dest pê kir.Bisedan muşek û bumbên jehrê dinavbera herçar

çavan da peqîn.

Dem û gehên xav.Bûne berevan....

Zanî ya lihîvîya berdewambûna suhbeta wî.

- Ez bûme mirovekê asayî.Bûme xudan mal û kar û heval ü pare...

Min gelek jirabûrdwyê xu jibîr kir.Gelek jixemên min bûne xewin.Barê min sivik

bû.Min şîya binivim.Min şîya biçime nav xelkî da.

20

Lirojê diçûme karî,û bişev limal heval limin kum dibûn.Suhbet û yarî û car em

pêk ve diçûne derê...

Deng jê nehat.Piştî qelem ji erkê giran xilas bûy.Ma lihîvîya devê wî.

Bêdengyê peyama birîyareka dijwar gehand.

Serê xu şor kir.Dengê wî kêmtir dihat.Rengê wî pêtî bû.Lêvên wî dinav rîh û

simbêla ra dilerizîn Çavên wî ji nînuka wî ya beranî ewa dinav tilên wî da

yarîya pê dikit vene bûn.

- Hevalên min gelek hez jimin dikirin.Gelek qedrê min digirtin.Gelek barê min

sivik dikirin. Biharîkarîya wan,ez bûme mirov.Hemû hewil didan,ez jîyaneka

asayî bijîm.Divîyan ez hemû rabûrdûyê xu lipşt xu bihêlim.Ez bû evro bijîm....

Axînkek rahêla,dengê pêşemanyê tijî gohên wî bûn.

- Min jî divîya bibime mirovekê dî.Min jî divîya bijîm.Min jî divîya dinîyayê û

xemên wê jibîr bikim.

Tila xu ya beranî bilind kire ber çavên xu. Her weku tiştek nû liser dîyar kirî.

- Rojekê,herdû nêzîktirîn hevalên min,ez mêvan kirim licihekî

taybet.bibîrewerîya jidayikbûna min.Wek wan digotin!

Bişkurîneka xaf lêvên wî girtin.

- Herçende kes nizanit ez kengî jidayik bûyme! Ez bixû jî nizanim.

Serê xu bilind kir,pirça zer veda,dû çavên şîn û dêmekê befirîn dîyar bûn.

Neşîya xu liber awrên wê yên tijî pirsîyar bigirt.

- Min gelek xu asê kir,lê digûtin ma tû jijina xerîb nebûy?Ma dilê te naçite

dinîyayê?Ma tû nemêrî?

Xudana çava serê xu bilind kir,bidû çavên mê berê xu dayê...

- Min jin jibîr kirbûn.Min hemû jin weku xecê dihijmartin.

Dengek dijwar jikaxezê hat.Til bigerdena qelemî ve bûne xilfa werîsekê zifir....

- Min gote wan.Her tiştê hebit,ez razî me.Tinê jin ne bin.

Wan gotin,me cihek taybet yê dîtî.Kêm kes dizanin.

Sê çar jinkên ciwan û biçûk limaleka dûr jiçavan û kes digel me nabit,em hersê

dê bitinê bin.Heta berê sipêdê em dê têr keyifa xu kin.Û tû evê carê mêvanê

meyî.Lê tinê vê carê haa!

Carên bêt,herkes kurê babê xûye....

Ez neçar kirim,min jî divîya jibaznê ez têda derkevim.Min jî divîya jiwê jora

biçûk derkevim Min jî divîya....

Xebata qelemî,ü nalîna kaxezê.Til yên sorkirîn. Çav yên dinav pirça har da xendqandîn!

- Her birêve,hevala birîyar dan,her êk jime biçite jorekê.Yara wî ya ciwan bit,ya

kirêt bit, ya biçûk bit,ya reş bit ya sipî bit.Ew û bexê xu. Da dilê me jêk nemînit.

21

Xudana pirçê,çav lê zîq bûn,hizar pirsîyar ji dêmê wê peşîn ser mêzê!

- Liber dergehî,jineka sere,bidevekê tijî kenî û bişkurîn pêşiwazîya me kir.

Hevala ez dame nîyasîn.Gelek keyifa xu bimin îna.Em lijora mêvana

rawestandin.Heval bilez bûn.Wan rêya xu dizanî.Hevalekî got,ez dî çime jora

destê rastê!Yê dî jora destê çepê helbijart.Ez neçar bûn biçime jora nîvê.

Xudana malê destê min girt,ü ez beref jora nîvê birim ü got.Bextê te gelek yê

başe, kiçeka ciwan û biçûk libenda te ye.Navê wê jîjî ye!

Lê hîvî ye,berî tû biçîye jor,xu livê serşoyê baş bişûy.Ü vê xawliyê dixu Bialîne

û cilkên xu bike divê kenturê da.

Paqijî başe ma neweye?!

Ew dûsê roj bûn min xu ne şûştî.Piştî min baş xu şûştî,ew xawelî havête

navtenga xu,ü rüs qesta jora nîvê kir.

Min dergeh vekir...

Hemû tişt rawestîyan.Neşîya baxivit.Tijî gewiryê dengê giryê bû.Kilmîşê wî rûn

bû,firfir jidifnê hat.

Xudana pirçê biçavên tijî pirsîyar û hêbetî berê xudayê.

- Dibit tû dibêjî eve çi girî û rondikin?!Ma çi divê hemûyê daye heta tû hosa

bigirî?!

Ma çi tiştê neasayî divê çîrokê da heye?!

Ew peyv jî nivêsîn.

- Min dergeh vekir.Kiçek nazik û biçûk ya rûse liser zikî.ya govarekî di

xûnit.Pirça wê ya reş. nîveka pişta wê ya veşartî....

Min silav kir,byê limin bizifirt,bersivda.

Ew xawelîya navtenga min veşartî,min havêt. Ü rüs rûniştim ber tenişta wê.

Min yarî bikemaxên wê kirin.Bitilên xu pirça wê şe kir.Berî destê xu bihavême

sîngê wê.

Min divîya dêmê wê bibînim.

Wek xezaleka küvî xu qolpande ser piştê.

Xu bû min amadekir....

Giryê ser ji axivtinê stand.Tijî nav rîhên wî ronidik bûn.

Xudana pirçê çavzlkanê digel kir.ma lihîvîya bersiva wê giryê ü wan rondikan?!

Gewirîya wî hişik bû,ew perdaxa avê neşîya gewirîya wî terbikit.

Dergeh vebû,tijî perdaxa wî av kirin.

Lêva hiçkê xu dibin difina xura îna ü bire çava. Kilmîş û rondik têkel kirin.

Qelem wek bazekê birsî,ma lihîvîya lêvên wî yên dilerizîn.

- Xu qolpande ser piştê!Çavên me ketin êk.

Ez bê hiş bûm.Çavên min tarî bûn.Min ageh ji xu nema.

22

Ez liqêryên wî bageh hatim.Dengê wê heta evro tijî serê min e.

- Babûû.....?!

- Jîyan.....?!

Dergeh vebû,dû polîs digel dixiturek ü dû sistir hatine hindav serî.Milên wî

girtin,dirêj kirine erdî.Dilê wî perxandin.Derzîyek lizenda wî dan. Danane ser

textekê bitahêre ü dgel xu birin.....

6 –

Cih tarîye,germe,bê denge.

Ew oksicîna digehite difina wî,bêhna heşîş û tirîyakê jê difirt.

Leş yê wastîyaye,hizir dimirîne,hest nemaye. Ew derzîya berî çend demjmêra

lizenda wî dayin.Gehên leşê wî yên xaf kirîn.Şanên mejyê wî yên nivandîn.

Çend şanên şîm,jipaşîya mejyê wî hişîyar bûn. Digel hindekên jikartêkirina

benca derzyê rizgar buyn vêk ketin.Gîyanê wî birine vîstevaleka evînyê....

Xudana pirça zer ü çavên şîn.bidevekê tijî kenî û bişkurîn,lihindav serî

rawestîya.

Vê carê çu kaxez û ekte liber sînkê wê yê mê nebûn.Vê carê çu penteronên

teng liber nebûn.Vê carê pirça xu biser kiras û vîstanên xecê da berda bûn.Vê

carê ne ew jora hercar bû.Vê carê jorek bû dinavbera erd û esmanan da.

Jiber bejna wê ya zirav û bilind.Cilkên xecê bû dikurt bûn.Lê gelek jê dihatin.

Neşîya xu,jipêşve rabû,divîya bikite dinav sîngê xuda,divîya bihelînte nav dilê

xu,divîya bizanit eve çi xewne têda?

Berî her axivtin û pirsîyarekê jê bikit.wek nimayşkera cil ü bergan.Xu lipêş

çavên wî yên birsî hejand.

Wek ektereka fîlmên sêksî.Liber sîngî rawestîya. cilkên xecê kitkte lipêş çava

jiber xu kirin.Leşê xu yê zêrîn nîşa çavên wî yên har dan.

Êkser sêra çavên wî ketine bişkuşka memkên wê yên biçûk.

Hemû tişt jibîr kirin,gîyanê wî jikuratîya gehên pîr derket.Hest biçarde saliyê

kir.Nêratîya wî harbû.Neşîya pitir xu bigirt.Bezî xudana pirçê. Da ber sîngê

xu.dirêj kire ser wî textê nerm û paqij.

Divîya xu jî rüs bikit.Çu cilik liber xu nedîtin.

Nezanî çewa dê dest bizavatîya xu kit.Vîya ew Mirada didilî da bûye kul bicih

bînit.Destê xu havête pirça jidavên rojê,da berdifna xu.

Tijî mejyê wî bêhna mêyatîya wê bû.

23

Devê xu havête lêva wê ya binî.Û jidil mêt.Têr nebû,devê xu jorda beref

gerdenê bire xwarê.Dinîva memkên küvî husîn.Ezmanê wî kete ser wê xaça

zîvî.Ewa zêrevanyê licoka memkên wê dikit!

Çavên xu neqandin,nevîya ev vîstevale bibite xewin.Destên xu dileşê nazik

gêran.Neşîya nêartîya xu têr bikit.

Wek sê goşa bermoda.leşê wî kêşa dinav pêsîra xuda û givaşt.

Hest bihelîyana leşê xu kir.Hêşta destekê wî jipirça zer venebibû.

Hêşta şerê ezmanê wî û wê xaca zîvî bû.

Hest bi xuşîyeka dijwar kir.Dikuka xuşîya xuda, divîya çavên wê yên şîn

bibînit.Divîya bizanit ka ew çavên mê çi dikin?Çewa berevanyê ji xu dikin?!

Çavên xu vekirin!

Jîyana kiça wî ya dinav destên wî da xav bûy....

Bihemû hêza xu,kire hewar.Wek dîn ü hara, rabû ser xu.

Jor ron bû,heval hatine hindav serî,hindek av berdane gewirîya wî ya hişik.....

Berî liser kursîka hercar rûnit.Berî kelamça ji zendên wî vekin.

Xudana pirçê libenda wî bû.Kaxez û ekte damade bûn.

Bibişkurîneka şirîn.silava sipêdê lê kir.Ma lihîvîya leşê wî yê xav û wastîyay.

Xew tijî bîbilkên çavên wî ye.Mejî yê wî hêşta yê şêlîye.

Cinabeta şivêdî liser xu ranekirîye.

Xudana pirçê,bitila beranî yarî biqelemê xu dikir.Lihîvîya lêvên wî yên veşartî

bû.

Serê xu bilind kir.dêmê wê yê befirîn.Tijî hîvîye. Ew lêva şivêdî dinav lêvên

xuda hêray,Ya tere. Ew pirça hêşta cihê davên wê dinav tilên wî da sor.ya

tere.Xunavê bernedaye.vê sipêdê ya şuştî.Vê sipêdê cenabeta şivêdî ya liser

xu rakirî.Ew pirça şivêdî dinav davên wî da xendqî,tijî nav rîh û simbêlên wî

davên wê ne. Ew pirça bû wî bûye perstgeh,divêt her roj sipêdê tewav dikit.Vê

carê,ew pirç ya bipatekê sor lipatka xu girêday.

Herwekû jiçavên wî yên sor vedişêrt.

Ew memkên nazik,ewên şivêdî dinav lêv û didanên wî da direvîn.Heta nîvê

didîyarin. Qebê wî dixwazin.

24

Ew xaca şivêdî berevanî jicoka memkên wê dikir.Nihu îsa yê hilawîstî bibirînên

xu yên xuneluve.wek biçûkekê şum.yarîya liser befirê dikit.Yê hulîsankê libetenên memkên wê dikit.

Herweku ne ew zêrevanê ser şorê şivêdî bû?!

Ew çavên şîn.Ewên diçirka xoşyê da,buyne pelên agirî.Nihu reş xûya dikin.Dikil dayine.Eve ne çavên wê ne.Eve çavên jîyana kiça wî ne.

Qelem rewî.Rewîna seyekê har jê hat.Kaxez livî.Dengê renîya befirê jê hat....

Hest kir,ya hzirên wî dixünit.Hest kir,yê rüse liser kursîkê.

- bibure,ez nizanim çi bêjim?Ez bawernakim bişêm bezmanê xu yê lawaz.te tê

bigehînim?!

Serê xu şor kir.Xirxira qelemê liser kaxezê gohên wî simtin.

- Ez nizanim,çewa wê karesata hatîye serê min,bûte wêne kim?!Çewa bigehînmete?!

Dibit rüdanên hosa,gelek cara hatibine serê xelkên van welatan?!

Dibit ew rüdan liber te çîrokeka dubare ü sê bare ü deh bare bit?!

Lê bawerbike.Hindî dinîya heye,û hindî hebit, rüdaneka hosa liwelatê me dirust

nebûye û dirust nabit....!

Serê xu şor kir.Destên xu havêtine gohên xu. Dengê kaxezê gohên wî disimtin.

- Ez neşêm bûte dîyar bikim jiber çi?Dibit dîn û rewşt,me jivan karesata diparêzin?!

Serê wî giran bû.Stuyê wî neşîya barê giran helgirt.Tijî devî bawşkên xewê

bûn.

- Wê rûdanê jîyana min dûbare aluz kir.Ez hêr kirim.Ez har ü dîn kirim.Ez

kirme mirovekê bê hiş ü mejî.Bê çav ü dil.

Min hest biçu tişta nedikir,min ageh jiçu denga nema.

Ez liqêryên kiça xu hişîyar bûm.

Dûsê zegzega milên min girtin.Ez birime derê. Ez rüs ü ew rüs.dinav wê kuma

mirovan da. Hewarên wê diçûne beresmanan.Duwa milên wê jî girtin û birine

cihekê nedîyar.

Ez Mam dinav distên wanda.Heta polîs hatîn.

Hêşta ez yê bê hiş bûm.Hêşta min nedizanî çi bûye?!Hêşta min bawer ne dikir!

Min neşîya çu bersiva bidim,min neşîya çu pirsîyara bikim!Min ne şîya

baxivim....

Tinê min zanî min liser kaxezekê îmza kir.Wesa dîyar bû,min mav nîne mayê

xu dikarê kiça xu bikim.Ew azade çi karê bikit û lici cihê hebit!

25

Ez ketime nav kulanên berlînê.Ez nizanim çend roj û çend şeva,ez wesa bê

hiş Mam.

Ez nizanim çewa dinivistim?Min çi dixwar? Likîve dijîyam?!

Ew hevalên digel min.Gelek pirsîyara min dikirin.Cihê min zanîn.Ez birime nik

xu.Piştî demekê dirêj,min ageh jixu bû,lê ew karesat, wek xewinekê dihate pêş

çavên min.Min bawer nedikir.Min nedivîya bawer bikim. Birînên min pêtivî

demekê dirêj bûn.

ez diberzebûneka dijwarda dijîyam.Ew rûdan dibûne xewin,dibûne

kabûs.Şevên min dişêlandin.Min nivistin nema.Min xwarin nema. Min kar

nema.Min heval neman.Heta min baş ageh jixu bûy.Rûdan bû min dîyar bû.

Ez necar bûm wek rastîyeka jîyana xu wer bigirim.

Ez ketim beranberî rastîyeka tal.

Serşorî û razî bûn biher tiştê xecê û kiçên wê dikin.Û her axivtin û gotgotkên

xelkî?!Yan xu kuştin....!

Xudana pirçê,serê xu bilind kir.Dû til dane bin wan davên pirça xu,jiber çavê xu

yê rastê ladan,havêtine pişta gohê xu.Hizar pirsîyar ji awiryên wê dipeşîn.

Wek bersivdaneka bilez bû wan hizar pirsîyaran.

- Jiber min pê çê nabit xecê ü kçên wê bikujim.Divêt xu bikujim?!

Erê....Min ev birîyare da,piştî gelek hizir kirinê,ü gelek ligîyanê xu gerîyayim.

Min birîyar da xu bikujim!

Ew davên pirça wê dîsan kitkite hatibûne hindav çavê wê.Vê carê bibinê

qelemî ladan. Awirîyek dayê û bilez zifirî karê xu.

- Lê çewa xubkjim?!Kengî û likîve?!Bi çi amîr?

Çend pirsîyar bûn.Bersiva wan linik min nebû. Ez dinav wan pirsîyaran da berze bûm.Min xu jibîr kir.Min dinîya hemû jibîr kir.

Dengê wî gelek nizim bû,xudana pirçê destê xu dida bergohê xu heta baş goh

likazndên wî bibit.

- Carekadî,serê min û dilê min bûne gorepana xemên xecê û kiçên wê.Carekadî,ez neçar bûm,bibim beşek ji şaşî û jîyana wan.

Ew dengê nizim jî çik bû.Wek peykerekê bê gîyan xûya dikir.Dû çavên zîq ketine wê pencera liberanberî sîngê wî.Gîyanê wî siwarî pêleka dijwara ronahyê bû.Ü derkete çîhana azadyê.

Wek xurtekê çarde salî,kulan û baxçên bajêrê berlînê têkvedan.

Tijî bersîngê xu dîyarî kirin.Her kurekê xu,hindek şirînahî û hindek yarî bû kirîn.

Dîyarîya xecê berî hemûyan dayê.wek gelek caran.

Kulunîyeka erzan bû,xecê bê razî nebû.

26

Dîyarîya evînê pêlaveka çimik bilind bû.Divîya dîyarîya jîyanê vekit.Serê xu

bilind kir.Jîyan ya rüse.wek ektereka sêksî ya şareza,xu pêşkêş dikit.

Tiv kire gîyanê xu,û jiwê gerîyanê biser şorî zifirande nav destên xudana pirçê...

Serê xu bilind kir,dû çavên şîn.Biwî qelemê dil req,yên hemû hizir û livînên wî

tumadkin.

Divîya leşê rüsê kiça xu jîyanê jipêş çavên xu nehêlit.

- Min vîya xecê bibînim!Min vîya hindek pirsîyara jê bikim!Min vîya bizanim ka

ewê ageh jikiça xu heye çi kar dikit?!Min vîya bizanim ka ew jê razî ye yane?

Axînkek jikuratîya gîyanê wî derket.Bêhna xwînê jê hat....

- Tinê min divîya bersiva van pirsîyaran bidit!

Bidengekê nizmtir.Serê xu şorkir,xu binünukên xuve mijûl kir.

- Xecê berzebû.Xu limin veşart.Min berlîn hemû têkveda.Min elmanîya hemû

têkveda.

Bitila beranî û ya şehdê.Yarî bisimbêlên xu kirin Herweku bêhnivedanekê

didite xu û xudana pirçê...

- Min xecê nedît.Ez bê hîvî bûm.Ez wastîyam. Ez nesax bûm.

Heta rojekê hevalek hate nik min ü got:

Evro xecê telefuna min kir!

Ez rast rabûme serxu,min nehêla axivtina xu bidawî bînit.Min bersîngên wî

girtin.Ü daxwaza cihê xecê jê kir...

Destê xu dana ser milê min ü got:

Raweste bira,date têbigehînim!

Ez sist kirim.Min bersîngên wî berdan ü mam lihîvîya devê wî.

Piştî rûniştî û bersîngên xu dirust kirîn,Got:

Evro xecê telefuna min kir ü got:

Bêje şêru bila bes lime bigert.

Heker lidüf serê xu biçit.Ez dişêm bisanahî wî berzekim.

Bila bela xu jime vekit.

Derbarey jîyanê,min agehî jê nîne ü ez jî jikarê wê nerazî me.Eve pitir jidûsale

min jîyan nedîtî ye.Bila bela xu jime vekit da wek mirovan bijîn. Mane bese ew

jiyê bişivanî me digel burandî?!

Van gotina çu aqil nehêla diserê minda.

Ez hêr kirim.Min kire hewar.Çu nemabû min ew heval xendqandî.

Min baş dizanî direwa dikit!Min baş dizanî ew gewada kiça xu jîyanê ye.

Ew bixu qehbeye.Ew bixu leş firuşe.....

Destê wî hevalî liser milê min,barê min sist kir.Ü got:

27

Wene bêje bira,her çewabit xecê jina te bû,û dayika biçûkên te ye û

dutmamate ye û...

Axivtina xu birî.Min zanî divêt tiştekî dî bêjit!

Min pitir bêhna xu fireh kir ü gotê:

Bêje.Te divêt tiştekî bêjî?Neveşêre,min çu nemaye ez şerm jê bikim.Hema

bêje?!

Piştî necar bûy, got:

Bibure kak şêru.Min nedivîya bêjim lê dê her zanî.

Xecî ya şo kirî....

Her weku muşekek biserê min ketî.Ez bê deng û bê hiş bûm.

Min nezanî ka piştî wê gotinê çi gotinên dî gotin?!Min nezanî çewa xatira xu

jimin xwast? Ü ka kengî çu û ka çewa ez hêlam?!

Erê....Xecê şo kir.Jîyan bû qehbe....Evîn çu digel kabirayekê kes nizanit çi

millet ü çi dîne....Welat yê bûye heşîş kêş liser cadên berlînê xazukyê

dikit.Tinê Kawe rengê mirovan didit.Ew jî yê licihê bê xudanan dixûnit.

Paşeroja wî jî hêşta ya nedîyare...

Herweku bû xu daxivit.

- Erê...Xecê şo kir!Min nezanî şo bikê kir?!Çi kese?Çi millete? Çi dîne?

Ev pirsîyare mane diserê minda,wek kiluxkekê rizî tijî kirim.Mejyê min

dixwarin....

Serê xu bilind kir da bizanit ka xudanê çava rondika bû dibarînit?Yan ew jî wek

gelek heval û biraderên wî tirana pê dikit?!

Xudana çava yamjûl bû bikarê xuve.Ageh jiçu nebû.Hind digehişt,awirîyekê

biditê da livîn û axivtinên wî bikite êk û liser kaxezê binexşînit.

Neçar bû,yadlê xu bû bêjit.

- Ew peyama xecê bû min digel wî hevalî hinartî,dilê min tena kir.

Raste min bawer nekir.Min nedivîya bawer bikim!Taybet piştî şo kirî.

Şo kirina wê ez jidil û gîyan hejandim.Şo kirina wê bû min karesat bû.Şo kirina

wê,liberanberî leş firotina kiça wê bû.Ez hêr kirim.Min çu nema bû bijîm.Mirin

bû min dîyarîyeka mezin bû!

Peyva mirinê jor bê deng kir.Qelem nivand, kaxeza destên xu bilind kirin.

Hizra xu dikon ü qolaçên tarî da veşartin.Mejî şir bû,leş xav bû.

Dergeh vebû,milên wî girtin.Jorda birine xwarê.....

Heval lihîvîya çîroka evro dironiştîbûn.

Her liderî.Perdaxeka çayê û çigarek danê.

Dûsê denga pêgive gotin:

- Ê...?!Dê bêje,ka te çi got? Ü te çi kir?

28

Xudanê perdaxa çayê û cigarê got:

- Jiserî heta te ev çaye û ew cigare jimin wergirtîn?!

- 8 –

Jor tarî bû,deng nema,livîn kêm bûn.

Ew pistpstên dihatin kirin,xewê xendqandin!

Dû çavên zîq,wek bînerê fîlmekê tirsê, temaşay dükêla cigara xu dikir.

Dükêla cigarê dibû bazin û bilind dibû,digel hizirên wî yên jengî yarî

dikirin.Çend dükêl bilind dibû,çavên wî zîqtir dibûn.Heta pêkve bibinanê

zîndanê diketin,dibûne bawişkên xewê û jorda binav çavên wî diketin.....

- Xecê şo kir....

Mejyê wî tijî tilîlyên kenîya xecê bûn!

Xecê jinav hindek kêrata derket.Lewendiyên xu yên havêtîne ser milên xu.Lêva kirasê xu ya kirîye diber duxwîna xura.

Menceloka şîrî ya dizendê da şor bûy.

Herçendekê,biserê dû tila perçema xu ji sêra çavên kilday didite paş.

Xu jibêrîvana vedizî.Lipşt reş mêweka tirî. Menceloka xu veşart.

Biçavên tijî kil,ma lihîvîya wî.

Çepek lixuda.Gopalê xu digîskeka şûm werand .Jiçavên bêrîvana dûr ket.

Qesta cihê jivanê hercar kir...

Lihndav serê xecê rawestîya.Çav lê zîq bûn. Reng lê zerbû.....

Xecê ya dinav destên zekzekeyekê reş û lêv doqçik da bûye şemamuk.

Destên wî yên req,yên memkên xecê diperxînin.Lêvên xu yên wermî,yên havêtîne lêvên xecê yên nazik.

Wek şemalika agir pêve,yadinav sîngê wî yê bihêzda dihelit.

29

Dest da gopalê xu bilind kire hindav serê yarê wê yê reş.Da xecê jibin kelexê

wî yê dirinde bînteder.Lez kir da lêvên xecê jinav wan doqça qortal bikit,lez

kir,da memkên xecê jinav wan til milhêba rizgar bikit.Lez kir, lez kir. Gopal

bilind kir.Hêza xu cemand.Navê xudê îna.Gopal weşande serê wî.....

Agirê cigara wî gehişte tilên wî.Til sotin.Hizir û xem û xew revîn.Rast rabû ser

xu.Jor ya tarîye. bê denge.Hemû wek mirîya dinav kifnên sipîda diveşartîne....

- Xecê şo kir.....

Recivkê leşê wî dagîr kir.Car tijî enîya wî xoh dibû. Car lê dibû ta sa.

Heta berê sipêdê ma hişîyar...

— 9 -

Berî deng jiseqata dergehê jora wî bêt,yê amadebû.Wek sofîyekê dîndar,berî

Mela bangê sipêdê bidit,dûsê sinneta dikit.

Rêya hercar dizanî,berî wan polîsên bûyine hevalên wî gavên xu dihavêtin.

Dergeh vekirin,qeyd vekirin.Gehên enîya wî venebûn.

Neşîya xu liser kursîka hercar bigirt.Tijî hinava ta sar bû,recifkê şer digel xewê

dikir.Xew wek ewrên zivistanê jihndava serî nediçûn.Rengê pîstê wî zer

kir.Çav lê sor kirin.

Çavên xu neqandin,divîya binivit.Xew weku biçûkekî şûm bela xu jê

venedkir.Yarî bigehên dilê wî yên xav dikirin.

Berî xew,leşê wî yê wastîyay dagîr bikit. Xudana çavên şîn lihndav serî

rawestîya. Qefteka kaxeza danane ser wê mêza dinavbera wanda.Dengê

peqîna muşekekê jê hat.Muyên leşê wî zîq kirin.

Ekta hecar vekir.Çend kaxezek têkivedan, cihekî vala amadekir,qelem kire

dinav tilên nazik da.Ma lihîvîya lêvên wî yên werimî...

Dû sê cara serê xu bilind kir,çavên wî ketine wan çavên şîn yên tijî jîyan.

Nînukên xu dane ber didanên xu yên zer.

Tilên xu têk werbadan,perxandin,kirine tizbî. Pirça xu pê xurand,pê şe kirin.Carekadî kirine dinav pîsîra xuda.

Cihê xu xoş kir,deng jigewirîya xu îna.Çavên xu neqandin.Vekirin,perdaxa avê

da ser devê xu. Cigarek berdayê,zû havêt.

Hemû berûykên xu têkvedan,qulpkên kirasê xu vekirin,girtin.

Ew tabloyên bidîwarî ve,diserê xuda şirove kirin.Rengê dîwaran û yê pencer û

dergehan. Û ew gilupa bibanî ve ne bidilî bün.

30

Divîya mayê xu direngê lêvên wê û rengê çilkên wê jî da bikit.

Zenga telefunê çetên hizir û xewê revandin.

Ew çavên şîn ji çavên wî yên wastîyay û tijî xew û xem venebûn.

- Xecê şo kir...Jîyanê xu firot...Evîn bidûyiv evîneka vêlbaz ket,dawiya wê berzebûne... Welat yê bûye êxsîrê dermanka.Yê mirî ye, xuzîya mirina wî...

Kawe...Kawe yê bûye kurê vî welatî.Me nanîyast,nizanit çi millete?Çi dîne?

Peywendîya me roj bû rojê ya sist dibit.

Ez ditirsim ew jî berze bibit.

Herkesê lichê min bit.Her kesê ewa hatîye serê min,bête serê wî.

Dê çi kit?Dê çewa şêt jît?

Xudana pirçê serê xu bilind kir,hest kir ev pirsîyare jiwê hatin kirin!

Qelem havête ser kaxezê,bidû tila perçema xu jinav çavên xu lada.Neşîya

bersiva wî bidit. Lêvên xu gezandin.Hest bigiranîya pirsîyaran kir.

Dû qorç liwê ava libersîngê xu dan.Wek bêhnivedanekê da xu û wî.

Her zû lêve bû.Zanî heker bêhnivedana wan dirêj bit.Hevalê wê dê liser kursîka xu nivit.

Kaxez lêkdan.Binê wan dûsê cara libanê mêzê dan.Dengekê dijwar jê hat.

Dest da qelemî,çavzlkanê digel çavên wî yên têrxew nebûyîn kirin.

Lêvên wî yên dinav rîh û simbêla ve xendqîn. Berevanîyeka bê omêd dikirin.

- Ez nizanim çi bûte bêjim?!Ez nizanim min çi kir?Min çewa jîyana xu dibûrand?

Ez çewa dinivistim?Çi dixwar?Likîve dijîyam?!

Serê xu şor kir.bê deng bû,tilên wî ketine şerê xu kujyê.Divîya erd şeq bibit

kelexê wî yê genî daurit.

Çavên wê yên zîq,bêhna wî teng kir.neşîya serê xu bilind kit.Neşîya bêhna xu

hilkêşt. Tengav bû,zanî qortal bûna wî tinê bigotina rastîya rudanê ye.

Dûsê qorç ligewirîya xu ya hişik dan.Awazên giryê digel tifa wî ya tîr çûne xwarê.

- Rojekê....Bibure,ez neşîm bîjim...Min nevêt bêjim!

Destê xu havête perdaxa avê.Jireciva leşê wî, perdax nîvî bû.Ew ava may neşîya gewirîya wî ter kit.

Dergeh vebû,perdaxeka tijî av danane ber sîngî.Ewjî vala kir.

Serê xu bilind kir,qelem yê libenda lêvên wî...

- Rojekê min ageh jixu bû.Ez yê liber dîwarê westgeha berlînê ya serekî.

Tijî rex ü dûrên min kelexên nîv mirîne.

Wesa dîyar bû,çend dermankêşên berlînê lêk kum bibûn.

Ez nizanim,em çewa û jibûçi wesa lêk kum bibûn?!

31

Bûmin ew ne giring bû!

Min divîya bizûtirîn dem jiwî cihî dûr kevim,ez lixu zivirîm min...

Giryê ser ji axivtinê stand.

- Liber tenişta min....Ka ew çend roje...Birex minive...

Girî biser ket,neşîya baxivit.Tijî difina kilmîş bû. Bilêva hiçkê xu ronidik û kilmîş

têkel kirin.

- Kurê min,welat yê birex minive nivîsitîye.

Ageh jidinîyayê nîne.Dermanka leşê wî yê sotî.

Dema min kurê xu welat wesa dîtî.Agir berbî dilê min.Min jidil kire hewar.Ew

demekê direj bû ez jê bêhîvî bibûm.Min bawer nedikir dê bînim.

Min hemû azar û xemên xu jibîr kirin. Kartêkirina wan dermana liser min

nema.Min kurê xu welat da ber sîngê xu ü jdil kire girî.

Bê deng bû,herweku divîya bizanit ka xudana pirçê bawer jê dikit?Yan ew jî

yarîya bihestê wî dikit?!

- Lidestpêkê kurê min welati ez nenîyasîm!Niza jiber katêkirina wan dermanik

vexwarinên kiholî bûn?Yan ew demekê dirêj bû ez nedîtîm?

Min destê wî girt û jiwî cihî dûr kir.Min têr da bersîngê xu.Têr macî kir.Têr bêhna wî hilkêşa.

Em bûne pêtirankên xelkî.lê çu tişt bû min ne xem bûn.

Min kurê xu dît!Ez dê wî kime mirov.Dê wî ji xecê parêzim...

Nuke tû dibêjî.Tû bixu ne mirovî!Tû liser cade ü nav baxça dinivî!

Raste!Ez nemirov bûm.Lê piştî min welat dîtî, dê bime mirov.Dê jiber xatira wî

hemû tişta kim.Dê kar kim,da ew bijît,bixûnit.Dê xu birisî kim,da ew têr bixut.Dê xu gorî wî kim....

Firek liwê ava dibinê perdaxê da may da. Dengê fira wî tijî jorê bû.

- Min qesta hevalekî kir.Min xu havête nav mala wî.Min çîroka xu bû got.

Wî çîroka me baş dizanî.

Mala xu bû me vekir,gelek har me kir.Em çend rojeka man linav mala wî.

Heta em hatîne ser hişên xu.Me peywendî bihndek destgeha kir.Em hinartine

dixiturekî taybet.

Dixiturî birîyar da me lixestê binivînit.

Çîrok dirêje.Em gelek lixestê man.Ez berî welati derketim.Ez hinartme

kempekê,ez bûme xudan cih.Joreka biçûk likepeka bêxudana digel pîremêre

kê nesax.

Her roj diçûme xestê linik kurê xu welatî.Û bişev dihatime jora xu likempê.

Bêhna min fireh bû.min hest bitama jîyanê kir. Divêt ez bijîm.Divêt ez

karbikim.Divêt ez welatî bêxime ser rêya dirûst.Divêt welat wek min bijît.Wek

xelkê welatê me!Divêt welat bû xu bibite wec.

Hişên min hatine serê min.Ewa hatî ye serê min,hemû wek fîlmekî dihate pêş

çavên min.

Min birîyar da ez bijîm.

Erê min jidil birîyar da bijîm.Ne jibû jîyanê!

Min birîyar da ez bijîm da carekadî li xecê bigerm.

Xudana pirçê serê xu bilind kir.Dengê şivtana jigolaliyên wê hatin.

Çirîsk ji çavên wê yên şîn peşîn!

- Min gelek pirsîyar kirin.Ez gelek gerîyam.Min divîya xecê bibînim.Min divîya

bizanim ka jîyan likîveye?!Ka çi dikit?!Ka ew kar hêlaye yan ne?!Min divîya

bizanim ka evîn likîve ye? Çidikit?Çewa dijît?

Hemû limin berze bûn.Tinê min şîya xu bigehînme kurê xu yê dî Kaweî.Min

cihê wî zanî,ez çû me nik berpirsa wî cihî.min gelek hîvî jê kirin.Min suhbeta xu

bû got.

Tinê razî bû ez jidûr bibînim.Ü got divêt ez digel polîsa baxivim.Û divêt ew jî

razî bibit te bibînit.

Piştî çend rojeka,polîs hatine kemipa min. Wesa dîyar bû,pirsîyara min kiribûn

û berpirsên kemipê bibaşî ez dabûme nîyasîn.Lewa her zû izina min dan ez

kurê xu Kawey bibînim...

Dêmê wî geş bû,lerzika lêvên wî sist bû.

- Min karê xu kir,ü dgel dixiturê welatî axivtim. Da wî jî digel xu bibime

seredana birayê wî.

Gelek keyiva dixiturê welatî hat.Got eve beşeke ji çareseryê.

Wek tû baş dizanî.Piştî xecê şû kirî,û ez biserê xu ketîm.Biçûkên me her êk

birexekî ve çû bû. Kawe licihê bêxudana akincî bibû.

Piştî gelek pirsîyara û lidüv cuna,piştî min gelek kaxez îmza kirîn.Piştî min

bersiva gelek pirsîyaran day.

Hêlan em biçine jor.

Bê deng bû,çav lê zîq bûn.Her weku likawey digerit.Jor biçavên xu ser ü bin

kir.

- Lijoreka taybet Kawe lihîvîya me bû.

Min dergeh vekir,çavên wî bime ketin,tijî çava rondik bûn.Min neşîya xu liser

pîya bigirim.

Ez ketim ser kursîyeka nêzîkî dergehî....

Giryê ser ji axivtina wî stand.

33

- Herdû bira ketine beranberî êk!

Wek dû peykeran hişik rawestîyan.Hêbetî ü mendehoş bûn.Nezanîn dê çi

bêjine êk? Nezanîn silav kine êk.Nezanîn pirsîyara halê êk bikin.

Ew perpirsa digel me hatîye jor û gelek harî me kirî.

Gote Kawey,eve babê te ye.Û eve birayê te ye.

Silav bike wan.Yên hatîn te bibînin.

Te gelek cara pirsîyara wan dikir.Mate ne vêt wan bibînî?!

Kawe bê hiş bibû.Çu livîn jê ne dihatin.

Min neşîya jicihê xu rabim.Min destên xu vekirin ü got.

Were Kawe,were bersîngê babê xu.Were ez babê teme...

Giryê cihê axivtinê girt.

- Wî ez dinîyasîm.Lê bawer nedikir.

Mendehoş bibû. Nedizanî çi bikit başe.

Berpirsa wî carekadî gotê.

Kawe,ew babê te ye.Here nik.

Kawey kire xar û qesta sîngê min kir.

Min ew givaşt.Wî ez givaştim.

Min tijî mejyê xu bêhna leşê wî kir.Min têr kire girî.Em gelek wesa man.Me

welat jibîr kir. Welat bibû wênegirekê şareza.Hemû livîn û rondikên me tumar

dikirin.

Berpirsa Kawey,milê wî girt havête nav kuma me.Em hersê bûne êk peyker...

Ew jina digel me hatî ye jor.Dûsê caran çavên xu zilqotandin,tijî çava rondik

bibûn.

Em hêlan bitinê ü derket.

Gewirîya wî hişik bû,girî û recivik têkel bûn.

- Bibure,ez neşêm baxivtinê rewşa wê roydanê bikim.Ez neşêm wan çend

demjmêra biçend gotineka şirove bikim.Tinê ez dibêjim.

ew xoştirîn çirke bûn dijîyana min da.

Xudana pirçê perçema xu lada,stêrka çavên şîn êxistine lêvên wî yên lerzuk.

- Eve dû kurên min dîyar bûn.Eve nîveka mala min kum bû.Dibit em bizifirine

jîyana xu ya berê!

Dengê wî nizim bû,wek pîremêrekê nesax çîroka bû nevyên xu dibêjit.

- Min ser jiwan berneda.Biharîkarîya rêxiraweka mirovayetî.Me şîya welatî jî

liwî cihê Kawe lê dijît.akincî bikin.

Çareser kirin û çavdêrî û xwandin û jiyana wan kete wê mala bêxodanan.

Herçend rojan ez diçûme seredana wan.

34

Em bûne parçek,peywendyên me mikum bûn Ez pitir tena bûm,xemên min sist

bûn.

Min karê xu kire gerîyan.Gerîyan lixecê û kiçên wê.

Xudana çava hest biwastîyana wî kir.

Divîya bêhnivedanekê biditê.

Wî nevîya rawestit,hest dikir biwê rawestanê dê şon pên xecê û kiçên wê berzekit.

- Min daxwaz jihindek hevalan kir harî min bikin.

Ew dimekê dirêj bû min zanî evîn ya hatîye berdan jimêrî xu.

Hinda digotin,ya gehştîye dayika xwe. Hinda digotin ya gehiştî ye xüşika xu

jîyanê û digel wê kar dikit....

Van gotina ez hêr kirim.Ez dîn kirim.Çavên min tarî kirin.Rê liber min berze

kirin.

Sêra çavên wî kete kuma kaxezan.Jîyana wî, bixoşî ü nexoşî ve,yên dinav van

kaxeza tumar kirîn.Hemû axivtin û livînên wî.Hemû xewin û hîvyên wî.

Ev kuma kaxezan.Hemû jîyana wî ye.

- Min gelek xu wastand,ez gelek gerîyam,min pirsîyara gelek kesan kir.Min

daxwaza harîkarîya gelek kesan kir.

Tinê min divîya tiştekî ji jîyan û evînê bizanim! Tinê min divîya bizanim ka evîn

jî gehiştîye jîyanî?!Ew jî ketîye tora wê?!Ewê jî ew rê helbjatî ye?Yan ewa min

goh lê bûy hemû direwin?!

Xudana çava bêhnivedanek da qelemî.

Tilên xu perxandin,firek liwê ava liber sîngê xu da.Bilez qelem kire dinav tilên

xuda.Her weku dê qelem revit.Ma lihîvîya lêvên wî yên hişik.

- Min cihê xecê zanî.....

Xudana pirçê serê xu bilind kir.Çav lê zîq bûn. Ma lihîvîya wî ka dê çi lixecê

kit?Dê bi çi çek xecê kujit?!

Jor bê deng bû,qelem ma lihindav kaxezê.

Serê xu bilind kir,zanî tiştek got,kartêkirineka dijwar liser livîna qelemî kir!

Peşêman bû,lê neşîya ji gotinên xu lêve bit.

Çavên xu êxistine çavên wê,da bizanit ka kartêkirina gotinên wî çende liser

hestê wê?!

- Nav ü nîşanên wê,cihê karê wê,heval û dustên wê.

Hemû bu min xûya bûn.

Min hemû tişt jê zanîn!Heta rojê çend cigara dikêşt!

Çavên xudana pirçê zîq bûn.Dêmê wê sor bû. Çavzlkanê digel çavên wî yên

tijî serketin dikirin.

35

Ma lihîvîya destê wî,haha xencerek, demancek dê bilind bite bejna xecê....

- Pitir ji heyivekê ez wek sîbera xecê lidûyiv çûm!Pêngav bipêngav.

Çi dixwar.Digel kê di axivit.Çend maç bilêvên wê diketin.Çend dest diçûne

paxlên wê!Min hemû biçavên xu tumar kirin.

Serê xo şor kir.Cih şir bû.Yarî binînûkên xu kirin.

Çu nemabû,xudana pirçê birîyara bêhnivedaneka dirêj bidit.

- Rojekê,xecê jimal derket.

Kilîla dergehî dana bin wê pirta mehfîra liber derazînkê!

Piştê ew dûr ketî.min kilîl îna û ez çûme jor.

Mala wê ya lêkday û xoş bû.Wesa dîyar bû ne bitinê dijîya.kesek yan hindek

kes digel dijîyan. Ez gelek gerîyam,min çu şûn warên jîyan û evînê ne dîtin!

Bêna min teng bû,min hest kir,haha zirtekek dê ête jor,min dite ber xenceran.

Ez derketim û liberanberî mala xecê rawestîyam.Mam lihîvîya wî kesê xecê

kilîl bû veşartî.....

Lidur xu zifirî,divîya bizanit ka kesê dî goh lê nîne?!

Dengê xu nizim kir.Xudana çava, bêhna xu çik kir heta goh lê dibû!

- Piştî demekê dirêj.Êvareka direng.

Serê xu şor kire nav milên xu.Biherdû destan gohên xu givaştin.

Herweku gohên cîhanê hemûyê biwan destan digirt!

- Herdû kiçên min.Evîn û jîyan.Her êkê destê wê yê dinav destê gencekî da.Milên xu yên dayine êk û qesta mala xecê dikin.

Neşîya pitir baxivit.Hişik bû,livîn jê nehat.Jor bê deng bû.

Xudana pirçê ma lihîvîya wî.

serê xu bilind kir.wek peykerekî hate pêş çavan.Deng jixu îna.Çihê xu xoş kir.Kaxez têkvedan.Dû sê caran,binê wan limêzê dan. Kuxî.Binê qelemê xu

libanê mêzê da.

Ew peyker nelivî....

Tirsîya.Devê wê beş bû,çav lê zîq bûn.

Tila xu dana ser dukmekê.dû polîs û dixiturek û dû sistir,Hatine jor.....

— 10 -

Çavên xu vekirin,cih ne cihê carane.

Çu polîsa zendên wî venekirin.

Xudana pirçê nedîyare.Çu ektên sor nihênyên wî tumar nakin.

Joreka paqij ü lêkdaye.Ew textê liser dirêj kirî, hizirên wî birine cihê rûdanê.Zanî çi hatîye serî. Lidur xu zifirî,kes nedît.

36

Serê dû sistira diwê pencera liberanberî textê wî xûya dikirin.

Dergeh yê girtîye,pencereka mezin.jora wî ya rûn kirî.Liberanberî pencerê,baxçekê mezin tijî mirovin.

Hişên wî cemîyan,çavên wî jor wêne kirin.

Birex textê wî ve, mêzeka biçûk,bitilekê avê û perdaxek yên liser.

Dengê mirovan,berê wî da wê pencera mezin.

Xu jitextî havête xwarê,neşîya gelek dûr kevit, jiber wî sondê sêlanê yê bizenda wîve girêday.

Enîya xu bi şoşa pencerê vena.Tijî çavan dîmenên ciwan bûn.

Dengê mirovan,yê çûçkan.Kenî û yaryên biçûkan,werîyana pelgên daran.Livîn

û hatin ü çuna mêvanên xestê.

Zifirande rojên azadyê.

Dû biçûk yên digel seyekî yarîya dikin.Kiçeka sinêle,serê xu ya kirîye dinav sîngê hevalê xuda û ya nivîsitî.

Dû genca milên pîremêrekê nesax yên girtên û yên dinav paxçê tijî gol ü gîyada pîyasê dikin.

Jîyan diçirkeyên lezetê daye.Roj beref ava bûnê diçit.Zeratîya wê her ya pêtî

dibit.

Serma şerê tîşkên wê yên nazik û şermîn dikit.

Liser şerê dirinde yê tarî û sermayê ra.Tijî bin wan dara û liser wan textên asnî

mirovin.

Divan çirkeyên rojê da.mala mirovî ya germ û têr.Biheşta ser dunîyayê ye.Ligundî,sopa dara sor dibû.Qazana savarê û ya nîskê birex sopê ve didanan.Qoryê çayê liser derê sopê peqij vedidan.Çihê wî, liserê dîwanê yê

raêxistî bû. Dû Balîfkên mezin.Tirarekê ava tezî.Mêdeka nanê reşandî.Dû serên pîvazan.

Xecê wek pelatînka dinîva hewşê digerîya...

Çavên wî tijî tarî bûn.Kitkite baxçe vala bû.

Serma û tarîya wê êvara direng,neşîyan wan herdû evîndaran jêk vekit.

Wek peykerê dû evîndaran,liser wî textê sar bibûne leşek.Dû kutirên evîndar,dimên wan jêkve nabit.Dibine êk gîyan.Dibine şemalik, dihelyên.Carekadî dibine çira....

Divîya dinava şoşa pencerê ra derkevit.Qesta wan evîndaran bikit.Bêjite wan.Evînî vêlbazîye. bawerîya xu pê ne înin!Divîya bêjite wan, hewe ez û xecê

dîtin?!Me çend hez jiêk dikir?! Me çend êk divîya?!

Wî sondê sêlanê,ewê wek hefsarê gîyanewerekê dirinde,bilêva textî ve girêday. Zenda wî girt,nehêla biçit.

37

Çu jê nehat.Bû wênegirekê şareza,kamîra çavên xu êxiste ser wan evîndaran.Hemû livîn û çivêlyên wan tumar kirin.

Digel awazên kenîya wan,siwarî pêlên şev taryê bû...

Ligondê wan yê xudê jibîr kirî.Ewê dinîva gelîyekê dozexî da,wek kavle goristanan xûya dikit.

Liber derê gova pezî,lihîvîya xecê çavzlkanê digel stêrên bestyê girtîn dikir.

- Bibure,ez gîro bûm?!

- Xem nakit.Hatina te lêbûrîne.

- Min sare...Ez jiserma mirim.

- Were dibin kepenî minive.Wek tenürê ye.

- Dilê te biminive ye?Yan da nêzîkî te bim?!

- Herdû!Dilê min yê biteve.eve min fam kirî.Dilê min bû dilê te helîya.Ü bawer

bike leşê min wek sopa daraye.Dê leşê te kite agir.

- Ez ditirsim,min bisojit?!

- Heker em herdû pêkve bin,bila me bisojit!

- Gotinên te serma jidilê min revand.

Lêva kepenê xu vekir.

- Were dinav dilê minda,dê pitir tena bî...

- Vê êvarê.Ez ya ji te ditirsim!

- Tirs?!Ez û tirs pêk ve najîn...

- Ez behsê tirseka dî dikim!

- Tirs hemû êkin.Êk raman didin!

- Nene..Tirsa min jidilê te ye.Ez dinavda berze bibim.Ü nizanim derkevim?!

- Ma te libere ji nav dilê min derkevî hey gawir?

- Heker cihê min xoş bit.Heker yê germ ü nerm bit.Madê buçî derkevim?!

- Were (biceribîne) da pişt rast bî....

Kenîya wan dû sê pez jimexelî rakirin.

Xecê wek têjkewka xu havête dinav sîngê wî yê germ da.Dinav kepenê wî da

berze bû.

Cihê xu liser kunîyekê kayê lipaşîya govê kirin. Gov şir bû,dengê benîşt coyna

pezî digohên wanda wek mezîqeyeka xemgîn dihat.

Xewê dilê xecê dagîr kir.Gopal jidestê wî ket. Tijî govê deng kir.

Ew kafirê bû beranê tovî hêlayin.Rabû ser pîya. Pirpir jidevê xu îna.Lidûr

kafireka mê zifirî.

Kafir liqulaçekê necar kir.Xu havête ser pişta wê

38

Hestê wî nêr kir.Destê xu jitenişta xecê vekir. Bilind kire paxila wê ya

har.Benduşkek vekir. Cihê destê wî nebû.Êka dî jî vekir,tilên wî wek têşkên

kuremaran libişkujka mekê wê gerîyan.

Xew giran bû,leşê wastîyay xav bû.Tila,gehên wê yên eşqê hişîyarikirin.Germa

leşê wî,şanên mêyatîya wê har kirin.

Dengê gohnêlîya kafirê beran,biser ket.

Xuhê leşên wan ter kirin.Livîn zêde bû.Deng bilind bû.

Beranî ew kerê pezî hemû hişîyar kir.Tijî govê deng bû.

Dû lêvên tijî mû,bişkujka mekê wê kezandin.

Leşê wê xav bû,tijî gehên wê xoşîyeka mestane bû.

Nevîya ji wê xewna xoş hişîyar bit.Nevîya xu bilivînit.Nevîya ji wê zifiroka

xoşyê da derkevit.

Berî destê wî yê dî duxwîna wê liser kemaxên wê da bînte xwar.

Dengê rewîna seyê gewir.rast rakirine ser pîya.

Bilez karê xu kirin.Xecê wek diza ji govê derket.

Dengê dergehê jora wî enîya wî ji wê şuşa sar vekir.

Dêmekê şirîn,ü tjî bişkurîn,gotê.

- Êvar baş.Tû çewanê?Başî?!

Bibure.Demê dermanên te ye....

11 –

Liberanberî mala xecê,wek wênegirekê mandîbûy rawestîya...

Çavên wî yên tijî xew û xem.Jidergehî venabin.

Her dengek,her livînek,her pêleka bay.

Mûyên leşê wî tîj dikin!

Gelek cara,xew çavên wî şêlî dikin.Dilê wî dûr dibin.Leşê wî yê mandîbûy libin

wê dar goza mezin dikite komeka hestîyan.

Ew rêbar û akincyên wê kulanê yên dû dil kirîn!

Hind dibêjin yê mirîye?!Hind dibêjin yê nesaxe? Bahira pitir hizirên wan bû

kesekê dermankêş dihijmêrin...!

Kes mayê xu tê nakit.Dû çavên zîq,hindek cara wê kulanê tumar

dikin,carekadî dikevne bin barê giranê xew û mandîbûnê.

Xew giran bû,leş xaf kir.Çav nivandin.

Dengê qebqebka dû jina wek aveka tezî leşê wî yê nîv mirî gezandin!

39

Rast rabû ser xû.Çavên xu ji xewê daqotan. Bejna dû kiçên genc,kete

beranberî çavên wî. Her gencekî destê xu yê havêtî ye ser milê yara xu.Ew

bejnên bilind,dinav desên wanda wek dû qevtên golane.Her çend pênigaveka

di dine ber maça û digivêşne nav sîngê xuda.

Dû kutirên küvî ne,nevên jirikeha sîngê wan der kevin....

Kuma wan,beref mala xecê çûn.Nevîya ji çavên xu bawer kit.

Jipirça wan jêk nîyasîn.

Pirça evînê wek ya dayka wê xecê ye.Ya hilwî û kurte.Gelek çaran,wek pirça

kurika kurt dikirin.Jiber pîsatî û sipîh û kêçan û nebûna av û sabûnan ligundî.

Pirça jîyanê,ya dirêj û badaye.Pişta wê hemûyê vedişêrt.Libçukatyê digotinê

bûka behrê.

Piştî hatina wan bû berlînê,pêtivî nebû pirça wê jî kurt kin.Av û sabun zehfin.

Jîyanê bejna xu çemande cihê dayika wê kilîl lê veşartî.Lidur xu zifirî kes

nedît.Her çar pêk ve cûne jor.

Dengê girtina dergehî,hizirên wî cemandin. Hestê wî arand.Riha mêranyê

wermand...

- Kiçên min digel dû kesên bîyanê licihekî bitinê ne?!

Weku zarvekerekê şanûya (mantûman). Destên wî şer digel bay dikirin.

- Eve ezim vî dîmenî dibînim?!Ez hinde bê namûs buym?!

Destê xu havête tenişta xu,ew çardexura liser kelexê efserê dujmnî

ragirî,nedît...!

Lidur xu zifirî,çu dar ü ber nedîtin.Çu tiştên wesa neketine berdesitî.Bişêt şerê

namusê pê bikit....

Kete zifiruka bê huşyê.Serê rêya liber berzebûn. Desthelat liser kelexê xu nema..

Libiçûkatyê,gelek caran pirsîyar dikir.

Dema sovî Ehmed liremezanan dihate gondî, bû kum kirina zikat û xêran.Sovî

Ehmed cilên xu yên pîs jî digel xu di înan da jinkên gondî bu bişon.

Gelek caran pirsîyara jina wî dikir?Pirsîyara biçûkên wî dikir?!

Xelkê gondî digotin.Piştî çend heyivekan,sovî Ehmed jin înay,û hêşta xena bûkanyê bidestave bû.Zanî jina wî hez jikurê Melay dikir.

Rojekê jixew rabû,jina xu da düv xu,û bire mala babê wê.

Ji wê rojê were,ew jin berzebû.Kes çu jê nizanit. Kes nizanit çi lê hat?Çi lê kirin?

Herkesê pirsîyar bikit.Gelek deng pêkve dibêjin...

- Namûs barekê girane....

Gondîya hemûya dizanî,wê jinê şo bisovî Ehmed kir û yarê xu hêla.Yar jibîr kir.

40

Dibit her yar nebit?!Dibit hemû bêbexî bit?!

Kur û kiçan mavê evîndaryê heye.Kiçan dad dikin.Bû kuran lijinan digerin. Jinan dikujin.Mêr, linêçîrên dî digerin.

- Namûs barekê girane....

Liber dergehî rawestîya.Dengê mezîqeka har, hate goha...

Destê wî kete ser zenga dergehî.Dergeh vebû. Gencekê nîv rüs kete ber sîngî.

- Geremke?Te çi divêt?!

Bersiva wî neda.Destê xu da sîngê wî yê rüs û çû jor.

Dengê mezîqê digel kenîya kiçên wî jor kir bû keşekê sêksî.

Gencî milê wî girt.

- Dê kîve çî?!Te çi divêt?!

Çavên wî ketine çavên gencî.Destê wî ji milê xu vekir.Tiv kire bextê reş ü demanca çarde xur.

- Eve mala mine...!

- Malate?!

Bersiva wî neda,qesta kiçên xu kir.Herdû kiç yên li rex gencê dî wek pelatînka

lidur ronahîya şemalkê yarîya dikin.

Lihindav serê wan rawestîya.Çi jê nehat.Çu deng û livîn nekirin.

Çavên wî tijî xwîn bûn.Dilê wî bû volkana kerb ü kwînê.

Gelek liberukên xu gerîya.Paxlên xu têkvedan. Demanca sitîlî nedîn.

Ew narincukên wek tizbîya diber şotka wîra, nedîyarin.Ew çeqoya bû xecê hinar û sêv pê sipî dikirin.Lifirukexanê jê standin.

Dengê wî gencî û gazindên wî,hemû hişîyar kirin.

Çavên kiça bienîya babê wan ket.

Qêryên wan tijî jor bûn.Xu havêtine pişt yarên xu...

- Babû?!

Herdû genca bisanahî milên wî girtin,û jixanî kirine der.

Hêşta hîvî jiwan dikir.Divîya bizanit ka ew kîne? Çi dikin digel kiçên wî?

Berî bersiva wî bête dan,berî rastyê bizanit.

Turmbêla polîsa,liber dergehî amadebû. Bersiva hemû pirsîyarên wî dan...!

-12 -

41

- Eve hevalê mine...

-.....

- Eve mêrê mine... Em dê divan rojan da şahîya xu kin.

-.....

- Bela xu ji me veke.Bes mayê xu dijîyana me da bike.

-.....

- Em neşên heta heta ditirsa teda bijîn!

-.....

- Te çi jime divêt?!Em neşên digel te bijîn.Tu neşêy me xudan bikî.

-.....

- Dayika me jibêloqîya te revî,jikerbên teda şo kir.

Birayên me jite revîn,jite ditirsîyan.Tû egerî.

Te em hemû jimal dür kirin.

Tû egerê hemû nexoşyên meyî..

-.....

- Te em kirine qehbe.Te em kirine gorg lipêş çavên heval û biraderên me.Tinê

te xu divêt, tinê te jîyan bû xu divêt.

Te çi di kir li wî cihî?!Ha..?!Tû limin digerîyay?! Yan lidayika me?!

Yan ewa bû me heram,bû te helale?!

-.....

- Tû nizanî biçûka xudan kî.Tû neşêy digel mirovan bijî.Çi ya hatîye serê me.Tû egerî.

Bela xu jime veke.Jijîyane me derkeve.

Em jiberte kîve birevin?!heware....Heware…

Polîsekî kaxezeka amade dana ber sîngî. Qelemek kire didesitîda.

Gotê,livêrê îmza bike.Eve cara dawiyê ye,em te agadar dikin.Nabit tû mayê xu

di van mirovanda bikî.Cara bêt dê sizayê te gelek dijwarbit.

Bêy kaxezê bixwînit,dibin navê xu îmza kir.

Dû polîsa milên wî girtin.Birine derê.Dû sê caran li dur xu zifirî.kes nedît digel

baxivit.Kes nedît, gazindên xu bû bêjit.Kes nedît,dilê xu bû vekit. Kes

nedît,hindek xemên xu yên giran pavête ser milan.

Mejîy lê şêlî bû,xwîna dilê wî fîrîya.Xemên wî bûne çîya.

Hind xu dît yê dinîva paxçekê mezin da. Lihemû rexa mirovin.Libin dara,liser

textên asinî, liser rêyên bigola nexşandîn,dinav gîyay da...

Kumên biçûkan digel Mamustayên xu.Evîndar digel yarên xu.

Baxçe parçeke ji biheştê.

Deng û livîn,kenî û yaryên wan.Tijî dinîyayê jîyan kirîye.

Libin her darekê,cutek evîndaran wek şemalika bagirê evînê dihelyên.

Licihê yarîyan,biçûk wek pelatînka digel hevalên xu yarîya dikin.

Kenîya wê kiça dihêzkê da serinca wî rakêşa. Yarê wê,kemaxên wê

digirt,bilind dikite bersîngê xu.dûsê maça bizurî jê distînit.Û jorda berdidte

bay.Kenîya wê digel davên pirça wê ya zerDi bine peyamên aştyê.Careka

dî,yara wî dizifirte ber sîngê wî.Maçekê li enîya wê didit,careka dî bihemû hêza

xu pal didit berev esmanî.

Kenî ü dengê wan tijî baxçey jîyan kirîye.

..... Werîs havête wê dare tûya lipşta gondî. Destê xu havête cihê roniştinê yê

zifir bû, nevîya kemaxên xecê bizirînit.Nevîya leşê wê yê nazik,sor

bikit.Kepenê xu dana bin kemaxên xecê....

- Min bide bay....

Destên xu havêtine teniştên xecê.Tezîlanik biser leşîda çu xwar.

Çend carekê xecê ji wî dur diket,qotana dilê wî zêde dibû.Dima lihîvîya cara

bêt,ka dê destên wî çi parça leşê wê girt?!

Carbû carê,destên xu bilind kirin.Hind hest kir, destên wî ketine ser dû

hinaran.Xwîna dilê wî kire volkan.Nêratîya wî har kir.

Bay lêva kirasê wê bilind kir.Dû ranên sipî û tijî kuşt xûya kirin.

Xuha leşê wî zêde bû.Neşîya xu liber van (ixaratan) bigirt.

Xecê ji wê bilindahyê hate bersîngê wî.

Herdû milên wê girtin,ji hêzkê kêşa der,da bersîngê xu ü givaşt.Herdû bûne

gomtelekê evînê.Girêl bûn nav gîyayê biharê.....

Wan xwînkarên lêk kum bûyin.Liser kelexê xecê rakir.Wek bazinekê mezin

yên roniştîn. Mamustaya wan,ya dinîva wanda biherdû destan sîstemê yaryê

bû wan şirove dikit...

- Her kesê min ev tepe havête ber sîngî.

Ew dê navê navdarekê çîhanê înit.Û dê bilez tepê bû hevalekî dî havêjit.Ewê

dî dê navê welatê wî navdarî bêjit.Ü dê tepê bû hevalekî dî havêjit.Ewê dî dê

karê wî bêjit û hosa,heta dawiyê.

Her kesê pêzanîn nebûn.Ew dê jîyaryê derkevte nîva baznî.Û wî mav nabit

beşdaryê bikit heta dawiya yaryê...

Hemûya pêk ve kirine hewar ü dest qotan.

- Gelek başe...Em amadene...

Mamustayê,tepe ji vî destî,havêe destê dî. Çavên xu linêçîreka mijûl gêran.

Piştî êk helbijartî,tepe havête dinav kuşa wîda.

Wî bilez tepe kire dinav distê xu yê biçûkda û hizra xu kir.

43

Hevalên wî yarî pê kirin’ lê kirine lez...

- Dê zûbe bêje...Navekî helbjêre....

Destê xu yê tepe têda,bilind kir.Tepe havête di kuşa hevala xuda û got...

- Karil may....

Her bilez hevala wî bela tepê ji xu vekir.Bû hevaleka xu havêt ü got...

- Elmane....

Wê jî tepe bû hevalekî dî havêt û got...

- Nivîsere....

Wî hevalî jî bû êkî dî havêt ü got...

- Romannivîse....

Jiwan wêve jinekê serê xu yê dana ye ser ranê zelamê xu û ya nivîsitî.

Zelam yê rojnamekê dixwînit.Lidurên wan dû biçûk yê digel seyekî yarîya dikin....

- Xecê şo kir....

- Evînê mêrê xu hêla....

- Jîyan ya bûye leş firoş....

- Welat û Kawe,yên bûyine kurên vî welatî.Yên berzebûyin....

Dinîya lipêş çava zerbû.Rê nedît.Kete ser wê kursîka liber lêva rêkê....

- Bela xu jime veke...

- Em neşên digel te bijîn....

- Tû ne mirovî...

Çavên wî tarî bûn....

- Eve mêrê mine...

- Eve hevalê mine,em dê van rojan dewata xu kin...

- Bela xu jime veke...

- Dayika me şo kir...

- Birayên me revîn...

- Tû egerî...Jiberte revîn...

Gehên naviçaên wî wermîn.

- Em neşên digel te bijîn...

- Tû her reşoyê caranî...Tû her şivanê pezî...

- Em ne pezin,dê me bidilê xu çerînî...

- Em mirovin...Bihêle em bijîn...Bihêle em jibîr bikin...

- Eve ne ew gonde...Eve ne ew cehineme,ewa em jê revîn...Ev berlîne...

Berlîn...?!

Qotana dilê wî zêde bû.

- Here jime dûr keve... Bihêle em bijîn...

44

- Eve tû bû namirî....?!Eve belate bû jime venabit....?!

- Em neşên her jite bitirsin!Her jite birevin!Her lijêr kuntirola teda bin!

- Here jime dür keve...Dê bimire...Manate bû çî ye?!

Neşîya roniştî xu bigirt,xu dirêj kire nav gîyayê liber lêva rê....

Deng têkel bûn.Erd livî.Esman jorda hate xwarê.

Kenîya wan biçûkên yarîya dikin,digel qêryên kiçên wî,bûne awazên leşkerî.

Dengê hatûçûya mirovan,muzîka MP3 yên wan gencan digel gazindên xecê û

kiçên wê. Bûne xencer,dil lê kelaştin.

Dinîya ser ü bin bû.Qotana dilê wî zêde bû. Çav lê sor bûn.

Dengê sistirekê lihindav serî hat...

- Silametîy ye....

-13 –

Serê xu yê giran bilind kir.Ew pirça zer,lipêş çava, gewir bû.

Çavên şîn,zer xûya dikirin.Lêvên rengê xwînê, sipîtale dihatin pêş çavan!

Zanî,eve ne rastîye.Zanî eve,çavên wîne direwa lê dikin!

Çavên xu perxandin,neşîya xew û wastîyanê jê daqotit.

Firek li wê ava tezî da.Ew ewrên gewir jibîblkên çavên wî derneketin.

Livîna wê,denkê kaxezan.Çikçika qelemî. Mejyê wî hêran.

- Min çu nîne bêjim....Bela xu jimin veke....

Çend yê wastîyay bû,çend hîvî jê kirin,çend xu asê kir.

Rikmanîya çavên wê,zêdetir bûn!Qelem dinav tilên wê yên lipêş çava wek şivtana har bû.

Gelek ma,xu asê kir.Neşîya xu liber awirên wê yên jehr jê dibarî bigirt.Neşîya

xu liber pêlên pirsîyarên ji çavên wê dipeşin bigirt.

Zanî çend hîvî ya jê bikit.Bikevite ser çuka, pêlava wê maç bi kit.

Di vêt rastî dîyar bit.

- Min xecê kuşt....!

Dû çavên zîq,wek yên mê gorgeka birsî.hizar pirsîyar jê dibarîn.Kete enîya wî

ya xohday.

- Erê...!Min xecê kuşt û ez neyê peşêmanim....

Binînukên xu yên dirêj.çerm liser nînuka xûya beranî rakir.Xwîn tijî ser banê

nînuka wî bû.

Digotin,nabit nînukên mirovî dirêj bin.Da şeytan nivêja liser nekit.

45

Wî digot,bû hûn nahêlin şeytanê reben nivêja bikit?!Hewe hemû tişt bû xu

divêt?!Heta nivêja jî?!

Diberukên xu gerîya.Çu tişt nedîtin,wê xwînê pê paqij kit.

Dilêva kirasê xu husî...

- Divîyaba berî çend salan min xecê kuştba. Berî kiçên xu bikite qehbe.Berî

kurên xu berze bikit....

Xwîn jiserê qelemê xudana çava dipeşî.

Her peyvek dinivêsî.Serê xu bilind dikire navçavên wî.

Wek şerekê dijwar,dinavbera çavên wanda rû da.

- Min xecê kuşt.

Nevîya demî ji xu bibit,kaxeza tijî peyv havête ser mêzê.êka sipî kete bin

didanên qelemê wê yê har.

- Ez dizanim hûn bawer nakin min xecê kuştbit.

Destê xu yê seqet bilind kir.

Wek sîyasetmedarekê vêlbaz.

- Hêşta têra gîyanê xecê hêz ya divî destî da may.Hêşta ev destê dujmnî

neşîyay bibirt.

Dişêt namusa min biparêzit.

Herweku narincukek liber pên xudana pirçê day.Hişik û bê deng ma.Qelem

nemêr bû. Çavên şîn,zîq man lidevê wî yê dilerizî.

Peyva namusê.gehên wê xav kirin.Qelem dana ser sîngê kaxezên şarîyay.

Destê xu dirêj kire perdaxa avê.Da wî agirê dihinavên xuda vemirînit.

Jor bê deng bû,av liser aşî hate girtin.Gewirîya xûya hişik,bihindek ava tezî ter

kir.

Divîya vî şerî sist bikit.Zanî peyvên wî gelek didijwar bûn.

- Dibit namus linik hewe tiştek dî bit?!

Dibit,têgeha hewe bû namusê newek ya mebit?!

Wek mirovekê rewşenbîr,simînarekê pêşkêş dikit.

- Ez dizanim hûn bişaşî nabînin,demê kiçek bi düv kurekî bikevit ü leşê xu bû

bikite dîyarî!

Ez dizanim,hûn bişaşî nabînin,demê jinek mêrê xu dihêlit û roja dî mêrekî dî

liser sîngê xu dinivînit?!

Ez van tişta jihewe dizanim!Hûn dibêjin eve azadîya kesayety ye.

Ew kêşe ü bînîna heweye.

Wek serkirdekê sîyasî,birîyareka giring didit.

- Divêt hûn jî baş bizanin.Namus linik me,piştî mirinê ye.Berî dînî ye.Berî

welatî ye.Berî her tiştekî ye!

46

Hest kir,çend rojihelata navîn,yê bû desta diqotin.

- Em dişên gelek tişta liser xu qebûl bikin.

Em dişên hejar bijîn.Birsî bimînin.

Lê bê namusê!Tişteke,ji hêza me gelek girantire!

Herwekû çîyayek liser serî.Serê xu şor kir.

Destê wî yê seqet,hêşta yê bilind bû.

- Xecê,namusa min firot.Xecê,perda sitara me dirand.Em kirine benîştê devê

heval ü neyaran.

Serê xu hejan,divîya xem û rojên burî jê daqotit.

- Xecê xu firot.Kiçên xu firotin.Kurên xu firotin. Em hemû berze kirin....

Serê xu bilind kir,çavên xu êxistine çavên wê yên şîn.

- Ew jina namusa xu bifiroşt.Ne hejî jîyanîye. Nehejî manêye...

Bê deng bû.Hêşta deng jikaxez û qelemî dihat.

- Min xecê kuşt.

Qelem harbû,gewirîya wê hişik bû.

- Dê kiçên wê jî kujim....

Dengê ketina perdaxa avê ji nav tilên xudana pirçê.dengê bumba etomî jê

hat.Jor tijî agir û barot kir.

Zanî peyvên wî,jihêza wê girantir bûn.

- Dê kiçên wê jî kujim.Dê namusa xu şom.Dê xu jî kujim....!

Deng bilind bû...Dergeh vebû...

Dû polîsa milên wî girtin,birine derê.....

-14 –

Lihndav kelexê xecê rawestîya.

Hest bitama sergetinê nekir.wek rojên şoreşê. dema liser kelexên dujmnî dirawestîya û çekên wan liser kelexên agir pêve radikirin.

Xecê,yaketîye ser piştê.Destên wê yên bi wê kêra disîngîra çiklî ve.

Gelek hewil daye jisîngê xu hilkêşt.neşîyaye.

Pirça wê,wek tiraşeka tarî,dêmê wê yê veşartî.

Xwîn tijî bin kelexê wê ye.Cih yê serubin bûy. Nîşana berevanîyeka dijware!

Destê xu yê sax.Havête destikê kêra disîngê xecê ra çiklî,û kêşa der.

Kêr,bilind kire beranberî çavên xu.Serê kêrê hindek çipkên xwîna tîr jê werîyan.

Cihê birînê,wek kanîyeka bihara,xwîn jê za.,.

47

Destê xu yê dî,dana ser birîna sîngê xecê. Destê wî ter bû.Xwîna dilê wê hêşta ya germ bû.

Destê xu disîngê xu husî.Biserê dû tila,simbêlên xu şekirin!

Tijî difina bêhna xwînê bû.Çav lê sor bûn.

Dergeh lipşt xu girt,beref kulanê çu.

Ew kêra liser kelexê xecê rakirî,wek qevteka gola.dana ber dergehê mala xecê....

Kulan gelek dirêj bû.Bêhna wî teng kir.

Her zû,şerekê nihênî,dinavbera dil û mejyê wî da rûda.Berxudana wî sist kir.Bawerî bipaşerojê nema.Jîyan lipêş çava bû yarîyeka bê mana.

Dil liser mejî zal bû ü got....

- Te jiber çi xecê kuşt?!

Mejî bersiv da...

- Jiber bênamusîya wê!

Dilî pirsîyar kir...

- Ew bênamuse û tû binamusî?Mane?

Mejî şerm ji xu kir û got...

- Wê ez fêrî bênamusyê kirim.

Dil hemû rastîya dizanit.Got...

- Tû berî wê fêrî bênamusîya bibûy.Te ew neça kir.bû xu limêrekî bigert..

Dil û mejî likulaneka teng,ketin beranberî êk. Birîyar dan,bibine dawer.

- Sizayê wî mirovê xoştivîya xu bikijit çî ye?

- Sizayê wî mirovê mala xu wêran kit çî ye?

Dil yê nazik û tirsnuk bû.

Mejî dawerekê bê dile.Birîyara tulvekirinê da.

Divêt bizutirîn dem bête bicih înan.

Hizir dinav dil û mejî da berze bû.Bilind firîn.

Berî bicih înana birîyarê.Mav dayê biçite rojên welatî.digel heval û kes ü karan.

Rojên xuş, digel xecê û kiç û kurên wê.Rojên şoreşê....

Deng nêzîk bû,xoha leşê wî zêde bû.Gehên wî xaf kirin.Dinîya lipêş çava zer

bû.Deng nêzîk bû. Leşê wî giran bû.

Deng nêzîk bû,hizirên wî şêlî bûn.

Deng nêzîk bû.Mirada wî bû sîngê xecê yê tijî hîvî.Da serê xu wek gelek cara

dinav memkên wêda tena veşêrt.

Deng nêzîk bû.Xecê sîngê xu vekir,pirça xu da bay.Destên xu bû givaştina

leşê wî amade kirin.

Bawer nekir.bihemû hêza xu,xuhavête dinav sîngê xecê yê rüs da.

48

Dengê rawestîyana tirênê.Ew bajêr hişîyar kir....!

-15 –

Kelamçe jizendên wî vekirin.Danane ser kursîka her car.Hindek ava tezî

danê.jikartêkirina xewê hişîyar bû.Serê xu yê giran bilind kir.Çavên wî ketine

dû bizotên şîn....!

Nevîya xo mijül kit.

- Min berlîn hemû têkveda...Min elmanîya hemû têkveda...Min pirsîyara

dinîyayê hemûyê kir...Min jîyan nedît.Min evîn nedît!

Axînek rahêla.

- Piştî demekê dirêj,bû min dîyar bû nemayne lielmanîya.

Gelek pirsîyar jiçavên şîn dipeşîn!

- Ez dizanim te çi divêt bêjî?!

Erê min divîya jîyanê bikujim.Min divîya evînê bikujim...

Herdû çavên şîn,zîq bûn.Qelem har bû,gorî ji kaxezê bilind kir.

- lê berî ez wan bikujim,min divîya pirsîyara wan bikim.

Jibû çi wan ev kare kir?!Çi jiwan kêm bû?!

serê xu şor kir.Destên xu biçavên xuve şidandin. Herweku,bû gîyanê xu diaxivit.

- Limin berze bûn.Ez wastîyam.Min çu çare neman.Xecê bitinê ma liber destên

min.Min jî hemû kerb û kîna xu lixecê mezaxtin.

Çavên xu êxistine çavên wê yên sor dîyar dikirin.Şerm û tirs jibîr kirin...

- Erê...Min xecê bivan destan kuşt.

Hûn bawer nakin min xecê kuştbit.Hûn yên likesekî dî digerin.Hûn wesa bawerdkin,kesekî dî xecê kuştibit!

Min bivan destan xecê kuşt.

Destên xu bilind kirine hemberî çavên wê.

Destên wî wesa bilind man.Heta wastîyayin. Wek leşekê mirî,herdû destên xu

berdane ser banê mêzê.Dengekî bilind jê hat.Cilivek bi xudana pirçê ket.

Lez liqelemî kir,da berevanyê ji xu bikit.

- Erê,min xecê kuşt.Min divîya xujî bikujim.

Min jîyan nema.Dê bû kê jîm?!Dê bû çi jîm?!

49

Dengê giryê jigewirîya wî hat.Qelemî lez kir. Agir berda pîstê kaxezê.Şerî dest

pê kir.Dukêl ji kelexên mirî bilind bû.

Gelek wesa nema.Dem rawestîya.Livîn nema.

Herdû layena,alayên sipî bilind kirin.....!

-16 –

Destê xu yê rastê,jinav memkên wê yên dinav destîda xuh day,jorda bire xwar.Piştî biserê tila şehdê dûsê cara bişkuşka memkê wê yê çepê perxandî.

Biwê xoha bêhna biheştê jê dihat.destê xu dinav wî gîyayê dinavda nivîsitîn

gêra.destê wî kete kulîlikekê.Kulîlik kire diber pirça wê ra. Biserê lêva,cihê kulîlikê da ber maçan.

Carekadî,destê xu dana cihê berê û jorda bire xwarê.

Dest kete ser zikê mezin.Gelek caran perxand. Litiştekî berze gerîya...

- Jê bigere,yê nivisitî..

- Dê çewa hişîyar bit?!

- Te divêt hişîyar bit?!

- Erê?!

- Gelek zehmete!

- Ji bû çi zehmete?!

- Dinîya germe,û cihê wî hûyne.Mecbur nîne bête nav vê germê!

- Min divêt hişîyar bit,digel min yarîya bikit.

- Dê hişîyar bit,lê heker....?!

Genîyeka şirîn û şermîn jidêmî barî.

- Heker çi?!Ka bêje?!

- Nene.Çune. Bûte zehmete!

- Dê ka bêje ew çi tişte kurê min hişîyar dikit?! Bila çend yê zehmet bit?!

- Tû befira he dibînî?!

- Erê... Ewa liserê çîyayê gare?!

- Erê.Ew befir!

- Ê....?!

- Heker dayka kurê te hindek ji wê befirê bixut. Ew dê hişîyar bit...!

Hêdîka ji kuşa xu îna der.Rast rabû ser pîya...

- Tû here gondî,eve ez bû te çûme befirê.

50

Kenîya wê jidil hat.Xu girêl kire nav gîyayda. Wek sipîndarekê lihindav serê xu

dît.

- Ne dilê min,ez yarîya dikim.ez bi mirim û dermanê min ew befir bit.Ez

nahêlim tû biçîye wî çîyayê dûr û asê...!

- Min birîyar da,ev şeve tû befira çîyayê garey bixûy.

- Heker te ez ji dil divêm tûnaçî?!

- Min tû jidil divêy û ez dê çim.

- Min nevêt weku sîyamendî lite bêt!

- Sîyamend jiber xatira çavên xecê gîyanê xu ji dest da.Bû hêmaya dildaryê.

- Lê min nevêt ez te jidest bidim.Sîyamendê min.

- Ne xeca min,netirse,ez ne sîyamendê silîvî me. Ez şêro yê pêşmergeme.....

Deng jiseqata dergehê girtîxanê hat.Dîwana wî verevand.

Çavên hevalên wî,hizirên wî tumar dikirin. Xewinên wî,wek fîlmekê

sînemê.Temaşe dikirin!

Berî silava sipêdê lihevalên xu bikit.

Dû polîsa bikelamça,silav lê kirin.Û digel xu birine derî.....

-17 –

Kursîka her car liser dirünişt.Lipêş çava bû devê tîmsahekê birisî.

Mêza liber sîngî.Bû bîyabaneka bê dawî.

Pirça wê ya zer.Pêlên agirî jê dipeşîn.Çavên şîn, rondikên jehrê jê dibarîn.Qelem bû lulîya kilaşînkufê.Kaxez,mînên raçandîne.....!

Hemû yên lihîvîya lêvên wî yên dibin rîh û simbêla ve berze bûyin.

Lêv dihişkin.Çav yên zer bûyin.Pîstê wî sipîtale xûya dikir.

Serê xu yê giran,dana ser zenda xu.Liser banê mêzê.Çavên xu yên sor neqandin.

Mejyê wî,yê şêlî.Ser ü bin bû.Axivtinên xecî,wek nîvişkê meşkê biser ket.

- Ne şêro ne...Xu kure neke....

Hîvyên wê,hêşta tijî şanên mejyê wîne.

Dergeh vebû,dêmê xecê bikenîya wê ya şirîn. Kete beranberî dêmê wî yê agir

jê dibarî.

- Şêro..?!Te xêre?Çi bûye?Biçûk bisilametn?

Xu li axivtinên wê negirt.Digel xu bire jor.

Destê xu havête pirça wê ya rojê sê çar cara difina xu dikire navda,bêhna wê

dikêşa mejyê xu û bitilên xu bu şe dikir.

Bidestê dî.Kêrek jiber tenişta xu îna der.Bilind kire sîngê wê yê tijî hîvî.

Berî berevanyê jixu bikit.Birçkên xwînê tijî navçava bûn.

51

- Ne....Xu kure neke...

- Te ez kure kirim.Te namusa min firot.Te kiçên min firotin.Te kurên min berze

kirin.Te mala min xirap kir,te... Te...

Digel axivtinên xu.Kêr jisîngê wê dikêşa der û bilind dikire cihekî dî.

Xecê destê wî girt.

- Raweste.Berî tû xulyê biserê xu wer bikî.Divêt tû rastyê bizanî!

- Rastîya çi?!Min nevêt goh liçu direwên dî bibim.Min biçavên xu dît.

- Ewa te dîtî,min ageh jî nîne.Ez jî nerazî me.

- Piştî çi?Tû eger bûy,tû harîkar bûy,te gewadî bû wan dikir.

- Kes eger nîne jite pêve.Te mala me wêran kir. Te em hemû berze kirin.Te

neşîya xu bigihurî. Tû her may reşoyê şivan.Tû ne hatî ye gihurîn.Tû her ew

mirovê dinîya nedîtî.Te divîya gondî bi çîya û pez û kepenê xuve digel xu bînî

ye berlînê.Te divîya me wek pezî bigopalî xudan bikî.Em neşên digel te bijît.Te

ne hêla em ji kevilujankê xu derkevin.Te em berze kirin.Te em wek xu

mirandin.Min gelek xu biteve wastand. Date bikime mirov.Te fêrî jîyana mirova

bikim.

- Erê...Te divîya ez bibime gewadê te.Te dikuşa êkî da bibînim,çavên xu şor

bikim.Te divîya biserê xu bikevî.Tedivîya wek jinên berlînê bijî.Her roj dinav

nivîyna êkî da binivî...?!

- Ne.Min bikuje lê bêbextyê limin neke.Min namusa te ya parastî.Heta te ez

berdaym.Başî min ya şo kirî wek her jinekê.Yan te jin divîn û min mêr nevîn?!

- Û kiçên te?Tû baş dizanî likîvene?Û çi kar dikin?

- Herdû di şo kirî ne.Ew kêşeya mêrên wane. Min jî wesa goh lê bûye.?Ez

bawer nakim.Û nebidlê mine,ez jî nerazî me.

- Te fêrî qehbetyê kirin.Te rê nîşa wan da.Te...

- Min yan te?!Ew kî bû nîv şev serxoş dihate mal?!Ew kî bû pare jiçizdankên

wan didizîn û dikirine dipaxlên qehba da?!

Destê kêr têda harbû.Neva pitir nihênyên wî aşkira bibin.Jorda weşande dilê

wê...

- Dane...Lêbide...Min pirtpirt bike.Lê baş bizane min namusa te nefirotîye.Min

divîya xu biparêzim.Min wek te nekirîye.Her roj dikuşa jinekê da.Heta qedera

wî gehandî ye nivîna kiça wî ya bê xudan..Tiv,Hey pênamus...

Dane,te jimêje ez ya kuştîm.Dane... Dane...

Nevîya bikite hewar,nevîya bikite qêrî.Tinê fizkên xwîna dilê wê.Berevanî

jigîyanê wê dikirin.

Çav lê tarî kirin.Zal nema liser livîna destê xu yê kêr têda.Dest wek amîrekê

utumatîk kar dikir.

52

- Dê bi xû.Te gelek kul kirîne dilê min.Eve sizayê te ye.Eve dawiya her jineka

namus firoşe.

Şerî êklayenî dijwar bû.Xecê kete gefizka mirinê.Nevîya berevanyê jigîyanê xu

bikit.Tinê berevanîya wê jinamusa wê xort bû.

Dizanî şêro bawer nakit.Nevêt bawer bikit!

Divîya gohek hebit rastyê wergirt.Da rastî berze nebit.Bila gîyanê wê gorî wê

rastyê bit.

Kêr lidüf kêrê.Lisîngê nazik diçiklîn.

Ne wastîya.Kelex kete bin cencera kêrên wî.

Ne vîya çavên xu vekit.Ditirsa xecê bikenîya xu ya şirîn,gazinda jê

bikit.Ditirsîya xecê rabite ve, bidite ber sîngê xu wek berê.Ditirsîya.ev karê

dikit.Bibite rastî.Ditirsîya,xecê birastî kuştbit...!

Serê xu bilind kir...

- Min xecê kuşt....!

Cilfek bixudana pirçê ket.Jinav davên hiriz û pirça xu derket.Dest da

qelemî,xwîn jiserê qelemê wê rişt.

- Berî ez xecê bikuşim.Wê ez kuştbûm.Wê jîyana min kirbû goristan.Dinîya

lipêş çavên min tarî kirbû.Çu nemabû ez bû bijîm.Kes nemabû ez bû bijîm.

Hewe bû ew dad nekir?!Hewe bû ew zîndan nekir?!

Ez yê mirî me.Eve jimêje ez yê mirî.

Tinê hind gîyan dileşê min da mabû.Ez bişêm xecê pê bikujim.

Wek şervanekê bê umêd...

- Min xecê kuşt.

Çavên xu perxandin.Rondik digel kilmîşî têkel bûn.Bêhna wî biser neket.Firfir

jidifina wî hat. Awazên giryê jigerîya wî derketin.

- Min xecê kuşt.....Dê xu jî kujim....!

— 18 –

Şevê,leşkerê xu lihemû kun ü qolaçên kirtîxanê belav kirin.Jor bê deng bû.Ew

lêvên wastîyay yên pist pist dikirin.Kitkite ketine davên xewa har.Livîn hatin

serkut kirin.Çavên wî yên zîq, bibanê jorê ve mane hilawîstî.

Polîsên şevê yên taybet,lihindav serî rawestîyan Pistoka wî girtin,bilind kirine

ser textê sar.

liberanberî dadwerekî xudan wijdan.

53

Şev jinîvê burî,kulan divalane,bajêr yê nivistîye. Tila xu dana ser zenga dergehî û her lêda.

Tijî malê deng kir.

Xecê biçilkên şevê,dergeh bû vekir.Bizimanê nîv lal,mejyê tijî kihul.

- Tû bû dergehî zû venakî?Te hinde çi dikir?

Xecê milê wî girt,bire dijora xuve.Dana ser textî.

- Şêro,dilê min,dengê xu bilind neke,biçûk dinivistîne.Şerme jiber cîrana,dê vê

nîv şevê polîsa înine me!

- Bila cîran serê xu lidîwarin bidin.Ez jipolîsan natirsim.

Xecê cilkên wî jiber kirin.Dirêj kire ser cihê wî.

- Şêro...Bismam,hosa bûte dest nadit.Tû xudan biçûkî,tû ne gencî,vê nîv şevê

serxoş diêye mal. Tû şerm jixelkî nakî,matû şerm jibiçûkên xu jî nakî?!

Divîya bersva wê bidit,nehêla.

- Tû heta nihu likîve bûy?Tû digel kê bûy?Min divêt bizanim?!

- Ew ne karê teye!Vê pirsîyarê çucar jimin nekî! Ez azadim.Çi bikim!Digel kê

bim!Te zanî?!Yan carekadî bû te bêjim?!

- Ne....Min nezanî.Divêt tû jî baş bizanî....

Tila xu kire dinav çavara.Her zû peşêman bû. Zanî mejyê wî tijî kihule.Cihê çu

amuşkarî û gefa nîne.Lihêfa wî biser kelexê wî yê nîv mirî dada,dergeh lê

girt.Bermayîya şevê lijora kiçên xu bitinê burand.

Sipêdê,zû mal tijî deng bû.Her çendekê xecê tila xu ya şehdê dida lêvên xu.

- Hişşiş...Dengî nekin,babê hewe yê nivisitîye...!

Bû biçûka seyir bû.Babê wan her vî demî yê nivisitîye?!Jibû çi dayika wan evro

hosa ya xemxure?!

Xecê hest bipirsîyarên çavên wan di kir.

- Babê hewe yê nesaxe.Divêt baş binivit....!

Kesê bawer nekir.Kitkite xatir xwastin,beref xwandegehên xu çûn.

Dengê yê jihemûya biçûktir hat..

- Eve ez çûm.Bixatira hewe..

Xecê bersiva wî da.

- Hişîyarî xube.Nemîne birêve.Gohê xu bide Mamstayên xu....

Mal bê deng bû,çavên wî tijî xewe,kartêkirina kihulê hêşta serê wî bernedaye.

Xecê,perdaxeka avê û kupekê qehwê danane bersîngî.liser textê nivistinê.

- Sipêde baş dilê min.

Serê xu bilind kir,bejna xecê wek nêrgizeka geş,lihindav serî,tijî dêmê wê kenî

û bişkurîne.

- Sipêde baş...

- Tû têr nivisitî?!

Zanî dadkirina wî dê dest pê kit!

- Te çi divêt bêjî,hema bêje?!Ez yê amademe!

- Min divêt bêjim tû hemû gîyanê minî.Tû hîvî û umêdên minî..

Destê xu bidevî vene,nehêla bidilê xu baxivit.

Destê wî girt kêşa ber sîngê xu.

- Eve netinê gotinin.Min divêt te bikime didilê xu da,ez jite têr nabim.

Xu asê kir,destê xu jinav destê wê kêşa der.

- Bêje.Ez dizanim eve despêka şerekî ye?

- Şerê çi dilê min?Heker min hindek gazinde ji dilê xu kirin.Ma ew şere?!

- Gohên min divekirîne...

- Dê qehwa xu vexû..Em dê...

- Min zanî ew qehwe neya biherweye...!

- Ma eve cara êkê ye ez qehwê bû tediînme ser textê te?!Hey bêbext!

- Ne....Lê her car tû dadgehekê bimin dikî.Tû min dişûy.Min dikîye pêlava xu.

- Tû dilê minî,tû taca serê minî,tû...

- Ya te divêt dê bêjî,yan malê bû te bihêlim ü biçim?!

- Min çu nîne bêjim.Tinê dê hindek rastîya bûte bêjim,ü ez baş dizanim tû

mirovekê rasgo û xudan wijdanî.Heker tû razî,eva tû dikê?Da ez agirî berdime

xu û mala xu,

- Rastyên çi?Te vê carê çi libere bêjî?!

Wek daykeka danemir.Destê wî girt û perxand.

- Berê xu bide mala xu.Te çar biçûk yên heyin. Tû xudan mal û jin nav ü dengî.Çi jite kême tû van kara dikî?Kiçên te yên mezin bûyin.Hemû tişta dizanin.Pirsîyar dikin.Bawer ji gotinên xelkî dikin.

- ê..?!Hewe çigoh lê bûye?Ez çi karên şaş dikim?!

- Şêro dilê min.Tû baş dizanî min tû jigîyanê xu xoştir divêy!Ez gohê xu nadime gotinên xelkî.

Bîne bîra xu,evîna me.....

- Dirêj neke.Serê min yê wermî ye....

Dengê xu bilind tir kir.

- Şêro.Eve berlîne,berlîn.Tû baş dizanî berlîn anku çi?!Heker tû nizanî da bûte

bêjim?!

Deng jê nehat,çavên xu neqandin.Da enîya wê ya girê nebînit.

- Berlîn.Anku dinîya.Pêşketin.Zanîn.Paşeroj. Jîyan.Her tiştê dilê te bixwazit...

Eve jilayekî ve....!

55

Û jilayê dî ve...Berlîn,anku,zifirok.Berzebûn.Xu firotin.Helîyan dinav pelên

pêşketinê da.Ketin bin pîya.

Ankû cehinem..Şêro anku cehinem?Tezanî?!

Kenîyeka şermîn kete dêmê wî.

- Min jinû zanî,xecê tû ya bûye feylesuf û zana..

- Çi feylesuf û zana pê nevîn.Tû biçavên xu dibînî ew cawazîya em ketînê.

Gondê me jîyana xu lê burandî,di zikê gelîyekê kure da bû.Ne av ü ne rê û ne

kareb ü ne xwandingeh û ne û ne û ne û....

Bişev û rojeka,em xu liberlînê bibînin!Tû dizanî eve cawazîyeka çend mezin û

metirsîdare?!

Her weku hindek axivtin gehiştîne mejyê wî.Xu şir kir.

- Şêro.Em herdû nexwandewarin.Em herdû çu zimana nizanin.Em wek ker ü

lalanin.Em çu ji dinîyadarîya van welatan nizanin.Divêt em xu bigihurin.Divêt

em xu fêrbikin.Divêt em bizanin bijîn.Divêt em bizanin biçûkên xu xudan kin.

- Erê.Te divêt em wek berlînîya xu rüs bikin.

Em wek wan goştê berazî bixûn.Wek wan biçine dîskûyan...

- Nene.Dilê min ne.Nîveka xelkê berlînê bixû van karan nakin.Em xudan

biçûkin.Biçûkên me pêtivî harîkarîya mene.Zanîn û xwandin ne şermin.Em yên

livî welatî,divêt em zimanê wan bizanin.Divêt em hindek jijîyana wan bizanin.

Da em bişên biçûkên xu biparêzin jişaşyên vê

pêşketinê

- Wesa dîyare,te divêt tiştekî bêjî.ü bikî?!

- Min divêt em pêk ve bêjin û pêk ve bikin!

- Min çu pî çê nabit bikim.ü min nevêt çu direwa bikim.

- Te gelek tişt pê çê dibin.Tû gîyanê meyî.Tû bab û birayê meyî.Em bite dijîn.Tinê..Tinê..

- Tinê çi?Hema bêje ez dizanim te tiştek libere bikî?!

Hest bisist bûnê kir,nevîya destên xu bilind kit.

- Min çu liber nîne dilê min.Wek min gotî,divêt me ageh jibiçûkên xu hebit.

- Ma çi jibiçûkên me kême?!

- Bab jê kême.

- Ha..?!we bêje.Te divên ez biroj bûte amana bişom,tû biçîye karî û bişev libin

serê te,xizmeta te bikim..

- Bê bext nebe.Te carekê fireka avê daye me?! Tû heta nîvro yê nivisitî.Û hêşta em nehatîne mal.Tû diçîye derê.Berê sipêdê dêye mal yê serxoş û neve

mirov...

- Ma dê bû hewe çikim?Hûn bikarên min razî nabin.

56

- Wan tû divêy.Bû wan baxive.Bila bizanin wan jî milletek yê hey.Wan jî welatek yê hey.Wan jî hindek rewişt û tîtal yên hey.Divêt ew jî başî û xirabyê

jêk bizanin.

- Ew xema te ye.Tû dayika wanî,her yên digel te.

- Tû jî babê wanî.Ew pitir pêtivî tene.Biçûk gelek bawer ji babê dikin û çav lê

dikin.

- Bela xu jimin veke.

- Ez bela xu jite venakim.Û ez razî nabim tû heta nîv şev liderê bî û dema bêye

mal jî yê ture û serxoş bî.

- Heker tû bela xu jimin venekî!Ez dê malê bûte hêlim û...

- Erê.Te divêt bidilê xu bikevî.Her weku ez nizanim tû û hevalên xu yên wek xu

çi di kin?! Ez baş dizanim hûn çi di kin!Û likîve parên xu xerc dikin?!

- Wesa dîyare tû ya lişerekî digerî!

- Nexêr.Ez ya lite digerim.Te jixewa giran hişîyar dikim.Rastîya bûte

dibêjim.Berî tû berze bibî.Ü mejî digel xu berze bikî.Berî tu mala me xirab

bikî...

- Ez dê hewe berze kim?!Yan seruberê te,dê me şermzar kin?!Dê me kite

benîştê devên xelkî?

- Şêro..Gohê xu baş bide min!Te tinê dû helbjar hene...Divêt tû êkê bihelbjêrî.

Serê xu bilind kire navçavên wê yên tijî tirs.

- Tû gelek ya ezman dirêj bûy.

- Wek min gotî.Te tinê dû helbjar hene.Û divêt tû xu êk dil kî.Da bişêy jîyana

xu bibî ye serî.

Destên xu dane pişt gohên xu,gohên xu baş vekirin..

- Eve min gohên xu bûte kirine kuvik.Ka bêje te çi libere bêjî?!

- Heker te bivêt livî welatî bijî.Divêt tû xu bû jîyana wan amade bikî.Xu fêrî

ziman û karî bikî. Liber biçûkên xu rawestî da berze nebin.

Yan jî....!

- Yan çi?!Wesa dîyar e tû ya bûye mêrê min.Û ez yê bûyme jina te ü min ageh

jê ne?!

- Ne demê tiranaye.Min çucar mavê te wek mêr jibîr nekirîye.

- Pa?Yan çi?!Tû hereşa çi limin dikî?!

- Yan hilû destê me bigire,da bizifirine gondê em jê hatîn.Hêşta gondîya çu

şivanên dî bû xu negirtîn!

- Tû jineka bê şerev û bê namûsî.Herdem tû şivanîya min dikîye çikî ü didîye

nav çavên min. Herwekû min qiphetek kirî!

57

- Ne şêro...Eve rastî ye.Te jişivanyê pêve çu karên dî pêçênabit.Tû neşêy çu

karan bikî...

- Bes ezmanê xu dirêj bike.Te birîyara xu ya day Hema bêje ka te çilibere

bêjî?!

- Erê...Min libere xu bigihorim.Min libere xu fêrî ziman û xwandin û karan

bikim.Min libere wek xelkê vî welatî bijîm.Da bişêm biçûkên xu biparêzim.Da

jîyana gondî jibîr bikim.Tezanî.. Lê?!

- Lê çi?!Ha?!Ez astengim?!

Hest bibêhêzîya wî kir.

- Ne,dilê min.Tû ne astengî.Em pêtivî tene.Me harîkarîya te divêt.Em bêy te

neşên çu bikin. Em bêy te neşên bijîn.Mene hêle bitinê,barê me girane,harî

min bike.Em dê livî welatî berzebin.Eve berlîne,eve derîyayeka bê dawîye.Tijî

nehing û dirindene.Digel me be.Tû bû me hêz û şîyanî.Mene hêle...Me

nehêle....

Serê xu dana ser sîngê wî.

- Em bêy te najîn.Em bêy te dê berze bin.Me nehêle....

Deng biser ket.Livîna wî zêde bû.Jor ron kirin. Dûsê heval lihindav serî

rawestîyan...

- Şêro.....?!Şêro....Texêre?Hilû jixew rabe...?!

— 19 -

Hêşta tijî çava xewe.Hêşta gehên wî dinivisitîne.

Dû polîsa milên wî girtin.Liber dergehekî rawestandin.Dergeh vekirin.Destên

wî jiqeyda azadkirin.Berdane jor.

Navê xudê îna.Pê rastê havête jor.Berî silav kit. Dergeh lipşt hate girtin.

Kete beranberî bejneka bilind,pirçeka zêrîn,dû çavên şîn,dêmekê befirîn.

Hirza bire rojên zavatîya wî.

Dû hevala milên wî girtin.Bira zava kete pêşîya wan.Liber dergehê joreka bê

seruber milên wî berdan.Navê xudê îna,dergehê tenekê lada. bipê rastê hilda

jor.

Xecê biwê ciwanî û xemla xuve libenda wî bû.

58

Liqolaçekê destekî nivînên kevin dirayêxisitî bûn. Zanî ew nivîn neyên wanin.

Xecê bibejna bilind jipêşve rabû.Berî dergehî lipşt xu bigirt.Xecê xu havête

dinav sîngê wî da.

Vê sipêdê,gelek ma lihîvîya xecê.Gelek ma lihîvîya kenîya wê.Ma lihîvîya

germa sîngê wê.

Dengê birazavay jikaxez û qelemên xudana pirçê hat.Hemû hîvîn wî stewir

kirin.Ew kursîka bûye gorê wî.Libenda wî bû.Ew mêza bûye, helanê liser sîngê

wî.Libenda wî bû.Ew bejna zirav,lipêş çava bû bejna zelamekê nemêr.

Qelemê wê bû kilka düpişkî.Kaxez bûne bîyabaneka berîn.

Dîwar hatine êk.Ban,nêzîkî erdî bû.Pirça wê ya zêrîn.Bûne têşkên kuremaran.

Şerê man ü nemanê dest pê kir.

Wek şervanekê bê umêd.Xu havête diçeperê xu yê aşkira da,libenda golleyeka kore...

Zanî biwî çekê liber destî,neşêt berevanyê ji gîyanê xu bikit.Çekê dujminê wî

yê pêşketî ye. Çu çeper xu liber nagirin.

Dû çavên zîq,tijî xew,wek kamîreka şêlî.Dêmê wê yê befirîn,çavên wê yên şîn.Lipşt mêzê tumar dikirin.

- Min xecê kuşt...

Yarî binînukên xu yên dirêj kirin.

Qelem fêrî vê ristê bibû.Bisanahî liser sîngê kaxezê nexşand.Ma li hîvîya risteka nû.

- Min divîya xujî bikujim.

Ev riste jî ya vecy bû.Qelem newastîya.Ma li benda tiştekê nû.

- Piştî xecê ketîye dizifiruka mirinê da.Gelek tişt bû min dîyar kirin.Perde liser

gelek tişta ladan.

Piştî kêra êkê min disîngî çiklandî.Kete ser piştê. Destê min girt ü got...

- Xu kure neke,mala xu xirap neke,gohê xu nede gotinên fesadan.

Min gotê...

- Te mala me xirap kir,te serê me şor kir.Te namusa me bi erzanî firot.Te em

berze kirin.

Destê xu yê dî havête kêra disîngê xo ra.

ü got...

- Eva hatîye serê me tû egerî.Goneha teye.Te em hêlan û bidüv binê xu

ketî.Te em tuşî van şaşîya kirin.Tû hermay wek xu,reşkoyê şivan.Te neşîya xu

bigihurî.Te gond û pez û kepenê xu digel înane berlînê.

Min gotê...

- Te divîya ez gewadyê bû te û kiçên te bikim.

59

Tiv kire nav çavên min.

ü got..

- Heker tû gewad nebay.Da me parêzî.Da harî min kî.Da liber min ü kiçên xu

rawestî.Ne bi düv kîrê xu kevî û her roj dikuşa jineka qehbeda nivî...

Min kêr ji sîngî îna der,bihemû hêza xu lichekî dî da.

Cilivek bixudana pirçê ket.Çav lê zîq kirin.

- Min gotê...

Te ez vêrî qehba kirim.Te ez fêrî derê kirim.

Wê got..

- Direwa neke.Min çend digote te,were harî min.Xu fêrbike.Xu

bigihore.Karbike.Digel biçûka rûne.Digel biçûka biaxive.Digel wan yarîya bike.

Harî min bike.Ez bitê neşêm çar biçûka xudan bikim.

Min gotê...

- Te biçûk jimin dûr kirin.Te her şivanîya min dida pêş çavên min ü yên wan.Ez

neşêm digel wan rûnim.Ez şerm ji wan dikim.

Wê got...

- Tû şerm jibênamusyên xu dikî,tû şerm jibê mejî ü şivanîya xu dikî.Te neşîya

xu pêş bêxî.Te neşîya jidavên gondî rizgar bî.

Çend behsê gondî dikir,çend behsê şivanî û kepenê min dikir.

Kêr lisîngê wê zêde dibûn.

Her gazinde û lumên wê zêde dibûn.Gehên destê min stûr dibûn.Kêr disîngê

wêra zêde dibûn.

Dengê wê û hîvîya wê ya dawyê Biser dengê lêdana kêrên min ket.Biser

dengê kerb û kîna min ket...

Got..

- Were harî min...Xu kure neke...Malaxu xirab neke.Gohê xu nede fesadan...

Tilên xu wek şey dinav pirça xu ya qijavij çiklandin.Pirça xu biwan tilên

dilerizîn,şe kirin.

- Min xecê kuşt.

Ez neyê peşêmanim...!

Serê xu bilind kir,piştî tilên xu jinav pirça xu ya ne şekirî,înaye der.

- Ez neyê peşêmanim....

Serbilindîya wî gelek nema.Serê xu şor kire hindav sîngê xu yê tijî kuvan.

- Erê...Ez neyê peşêmanim.Lê ez jî tawanbarim. Divêt êk min jî bikujit!

Qelemî lez kir.Herdû çavên şîn,zîq bûn.

- Ez jî tawanbarim.Ez jî egerim.Goneha min jî bû. Min jî ew mal tuşî berzebûnê

kir.

60

Dengê xu nizim kir,nedivîya xecê digora xuda, goh lidanpêdana wî bibit.

- Erê...Xecê rast digot.Ez bidûv xoşyên xu ketim. Heta nîvro dixew,û bişev serxoş dihatime mal. Min ageh jimal û biçûkan ne mabû.Min ne di zanî çi dikin? Kîve diçin?

Her filsê dihate destê min,min dikire dipaxla jineka leş firoş da.

Ez gelek jimal dûr ketim.Min rengê biçûkên xu ji bîr kir.

Ez jixew radibûm,ew diçûne xwandingehan.Ez nîv şev dihatim mal,ew dinivîsitî

bûn.

Gotinên xecê diserî da deng vedan..

- Te nevêt biçûkên xu bibînî.Tû nizanî dê çi bû wan bêjî.Tû çu jidinîyayê nizanî.Tû nizanî biçûka xudan bi kî.Tinê te şivanî pê çê dibit....

- Lirojên bêhinvedana wan.

Serê xu şor kir.Zanî xecê dê digora xuda goh lê bit.

- Lirojên bêhinvekana wan.Min nedivîya wan bibînim.Min hest dikir.Ew bimin

razî nabin.Ew min kêm di hijmêrin.Ew şerm dikin,ez babê wan.

Bê ding bû,devtera hizirên xu serubin kir.

Lipeyvekê gerîya suhbeteka dî dest pê bikit.

- Ez û xecê jêk çûne paş.Em coda dinivîstin.Min jora nivistina xu bû wê

hêla.Ez lijora mêvana nivistim.

Serê xu jinav milên xu kêşa der,çavên xu zîq kirin.Likesekî gerîya bawer jê bikit.

- Lê ew eger bû.Wê divîya ez jimal dûr kevim. Wê ez lipêş çavên biçûkên min

reş kir bûm.Wê divîya hemû tişt bikevne didestê wê da.Wê divîya ew bibite

mêrê min.

Çu guhên vekirî ne dîtin,dengê xu nizim kir. Axivtinên wî jikûratîya hinavên wî

derdiketin.

- Wê divîya ez weku wê xu bigihurim.

Ez jireşoyê şivan bibime elmanekê çav şîn û pirç zer.

Xudana pirça zer,serê xu bilind kir.Bêy hevsarê qelemê xu sist kit.

- Wê divîya ez bibime elman.Wê divîya ez fêrî kumputer û ezmana bibim.

Bêhneka kûr hilkêşa....

- Birastî.Wê divîya ez bibime elman.

Kenîyeka xav kete ser dêmê wî yê zer.

- Reşkoyê şivan.Bibite elmanekê pirç zer û çav şîn.

Herdû destên xu biserê xu yê xelek hosîn.

Jorda danane ser çavên xu û şidandin.

61

- Min neşîya bibime elman.Min neşîya pirça xu zer kim.Çavên min yên reş,ne

bidilê wê bûn.

Rastîya çîroka me.Eve ye.

Min neşîya xu bigihurim.ü ya rast tir,min ne vîya xu bigihurim.Ez çavên xu yên

reş.Na dime biçavên şîn.Pirça min ya reş,liber dilê min ji pirçeka zer ciwantire.

Erê..Min neşîya xu bigihurim.Min neşîya fêrî kumpîterî bibim.Min neşîya çu

kara bikim.

Min neşîya xu bigihurim.

Wê jî neşîya min bigihurt.

Em jêk çûne paş.

Dinav şer û arêşên meda,biçûkên me berze bûn.Me ageh jiwan nema.Her êk

jime bi arêşên xu ve mijül bû.Me biçûk jibîr kirin.

Bê deng bû,gelek hizir kirin.Çavên xu neqandin. Bêhneka kûr hilkêşa.

- Şevekê..bû mîztinê ez jixew rabûm.

Min hindek ava tezî vexwar.Hişên min kum bûn. Ez gelek jibiçûkên xu xerîb

bibum.Min divîya bibînim.Min qesta jorên wan kir.

Lêvên wî lerizîn.Dûsê rondik jiçavên wî hatine xwarê,herzû dinav rîhên wî yên

dirêj da berze bûn.

- Min derê jora jîyanê vekir...

Dengê giryê ji axivtinên wî hat.

- Cihê jîyanê yê vala bû.

Min sehkire demjmêrê.Jinîva şevê bûrî bû.Min neşîya xu ragirim.Wê nîv şevê

min qesta jora xecê kir.Û jixew hişîyar kir.

Xecê wesa hizir kir,ez yê serxoşim.

Min suhbeta jîyanê bû kir.Her biçuve wernegirt.

Min kire hewar û dengê xu bilind kir.Bû xecê nexem bû.Xu pitir dinav nivînên

xu da veşart.

Destê xu bidevê min vena û got...

- Nîv şeve,dengê xu bilind neke.Dibit limala hevaleka xu mabit?!Xema wê

nexû.

Ma te kengî ageh ji xu bûye?Heta tu pirsîyara biçûkên xu bi kî?!Here binive ew

ne xema te ye!

Gotinên wê,diserê minda bûne zengil ü deng vedidan.Mejyê min ron kirin.Ez

mam hişîyar heta sipêdî.

Sipêdê hemû jixew rabûn,çune ser kar ü xwandinên xu.Ez Mam limal.Lihîvîya

jîyanê.

Êvarî dîsan hemû hatin.Tinê jîyan nehat.Jîyan dîyar nebû.

62

Dilê min kete.Gomanê,hizar pirsîyar ji nav çavên min dibarîn.

Xecê zanî ez yê lirastyê digirem,û yê rişdim bizanim.

Karê xu kir û derket.Piştê demekî kêm,hate mal. Jîyan digel bû.Her

liderî,bersiva pirsîyarên min dan.

Jîyan hate nik min û got..

- Bibure bab.Ez limala hevaleka xu bûm.Dayik û babên wê nelimal bûn.Divîya

ez linik wê bim....

Min bawer nekir.Lê min çu pê çê nebû.Divîya ez bawer bikim.

Dest da perdaxa avê biser agirê dilê xuda kir.

- Wesa dîyarbû,xecê nedişîya her tiştê bivêt bikit.Lewa birîyar da min jimalê

bikite der.Da bi dilê xu bikevit.

Piştê min gelek mayê xu dikar û jîyana wê da kirî.Piştî min gelek pirsîyar û

lidûv çûn digel dikirîn.

Çavên xu neqandin.Dengê xu nizim kir.Bêhna xu kûr hil kêşa.

- Nîv şevekê dû polîs liber derê mala min lihîvîya min bûn.Daxwaza lêburînê

jimin kirin. Gotin..

Bibure,nabit tû biçîye vê malê.

Min hest bikarestê kir.Lê min nedivîya bawer bikim.Ez pêkenîm û min gote

wan.

- Eve mala mine.Hûn dizanin yan ne?!

Wan gotin..

Em baş dizanin.Lê jina te xecê,daxwaza berdanê ya kirî.Û nevêt tû digel wê û

biçûkên wê bijî.Ü em yên birîyara dadgehê bicih di înin.

Min gelek hewil dan.min gelek xu asê kir.Tinê min divîya bêjime xecê te bû

wekir?!Te çi jimin di vêt?!Limin bibure!Ez dê xulamînîya te kim.Ez dê goh û

çavên xu girim.

Polîsa milên min girtin.Ez birme cihekî taybet. Kaxeza dadgehê nîşa min

dan.Dîtina xecê û ya biçûkan limin qedexe kirin.

Mal bû xecê ma.Xecê bidilê xu ket.

Piştî demekî kêm.Xecê şo kir.

Piştî demekî kêm.Jîyan jimalê derket,biserê xu ket.

Piştî demekî kêm.Evînê mêre xo hêla .

Welat kete ser cadê û tûşî heşîş û dermanka bû.

Mal bû xecê ma.Xecê mêrê xu îna ser mala min.Ew bû xudanê malê.Ew bü

babê biçûkên min.

Min çu pê çê nebû.Min neşîya çu bikim.Barê min giran bû.Xemên min zêde

bûn.

63

Min heval neman.Min kes nema harî min barê min helgirt.Hevalê min bû şoşa

areqê.

Heşîş û dermanka barê min sivik kirin.Min xu û dinîya hemû jibîr kirin.

Ez ketim ber lêvên çada û nav paxên giştî.Ez wek gîyanewerekî

dijîyam.Xwarin jitenekên gilêşî peyda dikir.

Ez gelek wesa Mam.Hevalekî xelkê welatê me. Ez ji wê berzebûnê rizgar

kirim.

Xuzî ez di wê zifirokê da mabam heta mirinê. Eva hatî ye serê min biba xewin.

Jor bê deng bû.Tinê wek nerazîbûnê jikaxezê. xirxir jiqelemê xudana pirçê

dihat.

- Wî hevalî,ez birime mala xu.Gelek çavê xu da min.Ez birime dixtura daxwaza

harîkaryê bû min kir.

Carekadî,ez hatim ser hişên xu,û bû me mirov.

Min ageh jixu bû.Min pirsîyara biçûkên xu kir.

Xecê limin berze bû.Evîn limin berze bû.Ez ji wan bê hîvî bûm.

Min Kawe licihê xudankirina biçûkên bê xwan dît.

Min welat wek kelexekî mirî,liber dîwarê westgeha berlînê dît.

Min... Min...Kiça xu jîyan....

Min kiça xu jîyan licihê leş firoşan dinav nivîna xu da dît....!!

- 20 –

Hola çaverê kirinê lifirokexana berlîn ya navdewletî.Tijî mirove.

Her weku xelkê berlîn û dewru bera.Dê berlîn çul kin.

Herçend çirkeyeka.Firukek bilind dibit û êk dikefite erdî.

Bîra kunstêngên nav reza îna bîra wî.Gelek cara lihindav kunstêngekê

dirawestîya.Stêng dihijmartin.

Dengê bilind bûyê,mûyên leşê wî kirine derzîk. Çavên xu gîran tijî hemû ciha

çaverî yên mêvan û xoştivyên xune.

Dêmên wan,tijî hîvî û bişkurînin.Her çendekê bireka mirovan jikuneka hulê di

êne der.Li nîva holê digehine çaverêyin xu.Dibite kumbuneka kenî û maç û

hembêzkirinî.

Herzû kitkite holê dihêlin ü qesta derê dikin.

64

Lirexê dî.Wek werîsî mirov yên lipşt êk,qesta kuneka dî dikin.Û diçine beref

firokên amade...

lihemû ciha,barana keyiv û hîvîya dibart.

Kes jikuntirulî natirst.Pasporta kesê neya sexte ye.Kes ne yê bê xudane.Kes

jicîhaneka cuda ne hatîye.Kes jidemê burî ne zifirîye.

Tinê ew ditirst.Tinê dilê wî jiqotanê narawestit. Tinê mêvanên wî yên jistêreka

dî hatîn.Tijî paxlên wan tirse.Ezmanên wan dibirîne.Çavên wan ditarî ne.

Çend deng jibilind bûyê di êt.Salek jijyê wî kêm dibit.Gehên dilê wî diwermin.Çav lê zîq dibin.

Gelek stêng hijmartin.Gelek firoke hijmartin. Mêvanên wî dîyar nebûn.

Enîya xu biwê şoşa pencera beranberî gorepana firokexanê vena.Tijî çavên xu

dîmenên firokên mezin kirin.

Dûdû sê sê firoke pêk ve bilind dibin,hindî wan didadine erdî.

Çara êkê dijîyana xuda,nêzîkî firokê bûy.Dema berê çekê xu daye bin zikê wê

û jorda bi agirve înaye xwarê.

Hingê nav ü dengê wî di nav hevalan da belav bû.

- Mala xudê ava.Heker dujmnî hinde firoke heban,da me qir kit.

Nihu tijî bersîngê wî firokene.Wek kutirên sipî xûya dikin.

Aax ..ax...Van firoka bisedan gond yên liwelatê me sotîn.Van firoka hizareha

biçûk û jin û gencên me yên kuştîn.

Ev firoke dujmnên mene.Dujmnekî tirsnuk.Diçite ber esmanan.Û agirê kerb ü

kina xu Berdidite hindav serê hejaran.

Dujmnekê bê dile.Şerekê bê şerev û tirsnuk dikit.

Dengê bilind bûyê pîstê wî zer kir.

Bilez qesta dergehê jinav firokexanê dête nav hola çaverê kirinê kir.

Hişik rawestîya.Çav lê zîq bûn.Dev lê beş bû. Gelek wesa ma.kes dîyar nebû,gelek hizir kirin. Gelek tirsîya.Gelek wastîya.

Gotinên hevala diserî da aşekê giran dihêran.

... Berî çend rojan,çend biçûk û jin lifirukexanê hatin girtin.Êkser hinartine welatên wan.. hinartine bexda.Hinartine berdestê dujmnî...

Êsker berze kirin...Berze kirin...Bexda... Dujmin....

Berî bikite hewar,berî serê xu lidîwaran bidit.

Xwîna dilê wî gerîya,pêla mirovan jidergehî beref dervey firokexanê dîyar bû.

Wek berxekî birisî,liberahîya kerê pezî rabû lîtka.

Çavên xu libejna xecê gêran.

Xecê gîro bû....Xecê nehat.

65

... Hindek biçûk û jin,yên hatîne girtin.Yên hinartîne welatên wan.Nav dujmnî.

Bexda...

Xecê dîyar nebû,bêhna wî teng bû,mejyê wî şêlî bû.Lêvên wî hişik bûn.

Wek kumeka hestîya,dicihê xuda rawestîya. Livîn jê nehat.Ew deng û livîna

lirex durên wî dihate kirin.Neşîyan tirsa wî verevînin.

Bêhna wî teng bû,divîya bikete hewar.Divîya qesta firokê bikit.Divîya xecê

jinav destên dujmnî rizgar bikit.Berî bigehte birîyara xu kuştinê.

Berî şêro pişta xu bidite hîvîya dawyê.

Berî bidilê tijî tirs û kul,berf mal bizifirt.

Tijî çavên wî dîmenê xecê yê bê seruber bû.

Wek gilêşê lidawya lavawê diêt.

Xecê,herdû kiçên xu yên kirîne dibin kefşên xu ve.ü yên dibin ebayê reş da

veşartîn.

Wek diza,bi çavên tijî şerm û tirs.Biduîv şopa mirovan,berev dergehî dihatin.

Şêro neşîya xu bigirt.Xu liser wê kutana libersîngî ra havêt.Û qesta xecê kir.

Ew polîsê liber dergehî,nevîya dilê wî bihêlit, nevîya xoşîya wî didifnada

bînit.Rê bû vekir. Digel çû beref cihê xecê û herdû kiça.

Şêro xu havête kuma wan.Dane bersîngê xu ü givaştin.

Polîs ma lihîvîya wan.Gelek wesa man,hol vala bû,polîs necar bû.

Milên wan girtin,berf dervey holê hajotin.

Tirsa xecê bû rondik û girî.Herdû kiç,bûne qevteka tirs û pirsîyaran.

Şêro bû xurtekî çarde salî....!

- 21 –

Serê xu bilind kir.Çu tişt lipêş çavên xu nedîtin.

Bawşkên xewê dev lê beş kirin.Çav lê tarî kirin. Hizirên wî bû ne ewrên

payîzî.Barana xem û kula jê dibarîn.

Wek mirovekê kure,destê xu liperdaxa avê gêra.Hindek ava tezî berda

gewrîya tijî xew. Ava tezî,zêrevanên gehên wî hişîyar kirin.

Deng lihemû şanên leşê wî vedan.Çav lê zîq kirin.

Cih her ew cihe.Dujmin her ew çavên şîn û pirça zere.Çeper yê bê

stareye.Çek yê çirüke.

Xu jêk kêşa,bawişkek jidevî derket.Zanî çu bê çê nabit.

Destên xu bilind kirin.Lipeyvekê gerîya suhbeta xu dest pê bikit..

- Rojekê,xecê milê min girt,wek zirteka.Ez bilind kirme bersîngê xu ü got..

66

Ji evro ü pêve nebêje min xecê.

Navê min ruza ye.Ez ruza berlînî me.Kes ne bêjte min xecê.Xecê mir,xecê nema wek wan roj û cihên jê hatî.

Ez ruza me...Ruza berlînî.Hewe zanî yan ne?!

Kenyê lêvên wî nexşandin.

- Ez jidil kenîm.Ew demekî gelek dirêj bû,ez nekenîm.Kenîya min digewrîya

minda bû kuxik.

Xecê ture bû,limin kire hewar,xu nerazî kir.Û got..

- Tû dê her mînî reşkoyê şivan.Tû na êye gihurîn.

Min gotê xecê,dilê min nav ne çûye.Divêt tû ji mejyê xu bêye gihurîn,ne jinavê

xu!

Dengê xu bilind kir,bidest û çava şer dikir ü got..

- Divêt tû jimejî bêye gihurîn.Nene,divêt tû jiserî heta binî bêye

gihurîn.Seruçavên te.Bejin ü balate.

Divêt te bikine mekînekê û bihêrin,dibit bibîye mirovekê dî?!

Kenîya min zêde bû.Turebûna wê zêdetir bû.

Ez neçar bûm bêjimê ruza...

Ruza min?Çav şîna min?Pirç zera min?

Xudana pirça zer û çavên şîn.Serê xu bilind kir. Bişkurînek liser dêmê wî hate

nexşandin.

- Wê zanî ez yê yarîya pê dikim.Hate hindav serê min ü got..

Bû zanîna te,ez duhî çûme fermangeha nasnaman,ü min daxwaza vî navî kir

û....

Bê deng bû.

Ez dizanim gihurîna nava li elmanîya gelek bi zehmete.Taybet navê êkê.

Min bîrozbahîya wê kir.Min baş dizanî ez neşêm ji birîyara wê lêve kim.

Navê xecê limal û linav hevalên wê bû ruza. Ruza berlînî...

Serê xu şor kir.Çavên xu neqandin.Weku sovîyekê dîndar,lêvên wî dilerizîn.

- Xecê serubin hate gihurîn.Jîyana me kire duzex.Mayê xu dihemû livîn û

axivtinên meda di kir.Çilkên xu guhartin.Pirça xu zer kir.Çavên xu şîn kirin.Zikê

xu heta nafikê rüs kir.Xu kire elman. Xu kire berlînî.Her weku bab ü kalên wê

xelkê nîva berlînê....

Ez neçar bûm bêjimê ruza.Hindek cara min jibîr dikir ü digotê xecê.Ez zû lêve

dibûm û digotê ruza.Kiç û kurên wê digotinê ruza.

Lê xelkî yarî pê dikirin.Lume dikirin.Nedivîyan têkelîya wê bikin.Her çende

xecê jî têkelîya kesên bîyanî nedikir.Taybet xelkê welatê me. Têkelîya wê tinê

digel elmana bû.Hevalên wê elman bûn.Digel elmana kar dikir.

67

Navê wê bû ruza.Lê hindî kar kir,neşîya liser pasport û nasnama,vî navî

danit.Xecê her ma liser pasport ü nasnamên wê.

Heval û nîyasên me navê wê kirine xeca berlînî.

Min gelek şerm ji xu dikir,min çu tişt pê çê nedibûn.

Xecê bû ruza.Gondê pirsî,bû berlîn.Tiraş û gelî bûne avahyên bilind.Pez û

gov,bûne turmbêl û mîtruyên bin erdî.Vanus bû kahreb.Kuçik û tenür,bûne

kumputer û tebaxên kahrebê...

Jîyaname ser ü bin bû.Gihurîn jişîyanên me zêdetir bûn.Bar jihêza me girantir

bû.Herzû ez ketim bin pîya.Min xu liber negirt.

Xudana pirçê,hest bixav bûna leşê wî kir. Çargava qelemê xu sist

kir.Bêhinvedanek da kaxezê.Tilên nazik yên jigivaştina qelemî sor

bûyin.Havêtine gerdena perdaxa avê,biser gewirîya xûya şarîyay da kir.Lêvên

wê yên sor terbûn.Biserê ezmanê xu lêvên xu vemalîn.

Çavên şîn,her ji enîya wî ya girê vene bûn.Xafil nekir.Heta serê wî yê giran

ketî ye ser mêza dinavbera wanda....

- 22 –

Gehên leşê wî gurç bûn.Şanên pîstê wî bûne kurîşik.Qorkên çavên wî,tijî xuh

bûn.Enîya wî bû mişarên birincî.

Livîna wî.Wek ya jina liber biçûkbûnê nexirî.

Ciliv vê diketin.

- Kiça te ya gehiştî ye xüşka xu jîyanê.

Hevalekî,berî çend roja licihê....Bibure.Lichê leş firoşan herdû dîtîne.

Xuh zêde bû,geh çirik bûn.Şan şîn bûn.Pîst zer bû...

- Kurên te diberzene.Piştî te xecê kuştî.Yên ji wî cihî birîn.Yên veşartîn.

Nîşa kesê nadin....

Livîn zêde bû,leş bû amîrekê utumatîk.Deng ji gewirîya hişik biserket.

- Hevalê xecê,kelexê wê licihekî taybet veşart. Nehêla em wek xu veşêrin.

Cubarên xuhê leşê wî kirine av.Bêhna wî şer digel gîyanê wî dikir.

Xecê jidûr,berev wî dihat.Bidestê rastê,destê kurê xu welat yê girtî.Û welatî

destê birayê xu Kawey yê girtî.Û bidestê çepê herdû kiç wek qevteka kula

bidüvra dibezîn.Wek dawetyên dil ter liber sîngê zirna bêjekî çillek rawestîyan.

68

Kenî û bişkurîn,jidêmên wan dibarîn.

Divîya jipêşve rabit.Divîya xu pavête nav kuma wan.Divîya gazî bikite

wan.Divîya bikite hewar, neşîya.Hişik bû.

Xecê destê kur ü kçên xu berda û bixardan berev wî hat.

- Şêro...Dilê min,nerabe.Tû yê wastîyay.Eve ez hatim.

Kur û kiçan,wek berîkanê dane bidüv dayika xu û qesta babê xu kirin.

Şêro,rabû ser xu,destên xu vekirin...

- Heçyê berê kezî zerê..

Heçyê berê kezî zerê....

Xecê berî hemûya xu havête dinav sîngê wî da. Kelevaş kire nav gîyay da.Xu

havête ser sîngê wî yê germ.

Her biçûkekê gehiştîye kuma wan,wek mignatîsî xu havête ser kumê.Heta

bûne gilomçkeka goştî û kenyê...

Bêhin hilkêşana wî sist bû.Geh xaf bûn.Şan nerm bûn.Xwîn hate bin pîstê

zer.Xuh sar bû,leşê wî nüsek kir.Ta sarê girt!

Leşê xecê yê girim,û kuma biçûkan,neşîyan tasara leşê wî sist kin.

Pêlên sermayê jinav pîstê wî derketin.

Bû mirovê bevirê.

Xecê û biçûkên xu jiserma leşê wî revîn.Tijî dilên wan tirs û serma bûn.

Hêlan bitinê.Gelek gazî wan kir.Gelek hîvî jiwan kirin.Kes lê ne zivirî.

Divîya digel wan biçit.Divîya bigehite wan. Rabû serxu.Xu ditextê xuda havête

xwar.

Ew hevalê hindek cara lizîndanê di ête seredina wî lihîvîya wî bû.

- Evîn û jîyan yên bûyine leş firoş.Welat û Kawe diberzene.Kelexê

xecê,likurstana elmana veşartin.....

Min kes nema bû bijîm.Ez lihîvîya çi me?Ez bû kê dijîm?Min çi îna serê xu?

Dengê polsekî,hemû tişt bidawî înan.

- Karê xu bikin,dû demjmêran herine nav baxçê girtîxanê,da roj lihewe

bidit.Kes nemînte lijor...

Jor vala bû,şêro ma dinav nivînên xuda.Xewin û hizra pên wî qeyd da bûn.

Hêşta dengê kenîya xecê û biçûkên wê tijî nav nivînên wî bûn.Hêşta ew

hevalê hestîgiran raborta deng ü basên kiçên wî dixwand.Hêşta leşê wî tijî ta

sar bû...

Jor bê deng bû.Jor vala bû.Kes nema.Cih şir bû. Serma zal bû.

- Kiçên te yên bûyine leş firoş.

- Herdû lichekî kar dikin.

- Berî dû roja hevalekî ditibûn...

69

Destê xu bire bin Balîfka sar.Tiştek jibin îna der. Bilind kire stêrka çavên xu.

Kenî....Girî....Kuxî....Carekadî jidil kenî...!

- 23 –

Destê xu bilind kire beranberî dêmê xu. Ronahîya gilopa bibanê jorê ve,kete

wî devmuskê dinav tilên wî da.tîşka ronahyê çav lê tarî kirin.

Tila xu ya beranî.Liser devmuskî şidand.Rexê dî yê devmuskî,kete ser tila wî

ya şehdê.

Serê devmuskî yê tîj,dibirsqî.

Dest bilind bû,serê devmuskî yê tîj.Kete ser riha stwyê wî ya stûyr.

Çavên xu neqandin.Şahde da.Reh wermî.Xwîn pengîya.

Navê xudê îna,bihemû hêza xu ew tîyê tîjê devmuskî,da bin riha stûyê xu.

Fizka xwînê kevalek liser dîwarê girtîxanê nexşand.....

- Xecê şo kir.

- Evîn digel xüşka xu bûne leş firoş.

- Welat heşîş kêşe.

- Kawe yê lichê bê xudanan..

- Min xecê kuşt.Xecê mir.

Evîn û jîyan bûne qehbe...Welat û Kawe berzebûn.Polîsa veşartin...Kelexê

xecê linav elmana veşartin....

Kelexê şêro ma bê xudan....

Bajêrvanîya berlînê necar bû,likurstana bê xudanan birex gorê xecê ve.Kelexê

şêro bin ax kirin...!!
**

XEZEBA AZADIYÊ

Laleş Qaso
KomaL
Weşanxane: KomaL
Çapa duduyan: 2009
5
BEŞÊ YEKÊ
1
Di hikmê pênc-şeş salan de, li Zorava û temamê
herêmê gelek kevirên mezin ji cihê xwe leqiyan û gelek
tiştên ku bi mirov wek dûrî êqilan xuya dikirin hatin

guhertin. ”Qantir za; şêr û piling li hev hatin û gur û pez bi hev re çêriyan!”
Zoraviyan bi dû girtina Circîs de, êdî nema bi hev re berberî kirin. Bêyî ku hin wan li hev bînin, bi haweyê ku ro here ava ber bi hev de çûn û agirê nav xwe tefandin. Li hev hatin, lê ewqasî jî bi hev re ne dan û ne stendin. Ji dil û can nebûn dostên hev, lê li xerabiya hev jî ne geriyan. Bi hev re limêj ne kirin, lê silav dan hev. Li malên hev rûneniştin, lê li navtarên gund rahiştin destê hev. Bêşa ku başçawîşê qereqola Stlîlê diavêt ser gund, teslîmî Bedrên kirin û rêya xwe ji ser qereqolê dagerandin. Bi qasî ku ji qereqolê dûr sekinîn, ewqasî nêzîkî mirovahiyê bûn. Piştî demekê ew bêş jî rakirin. Hêkên qelandî û goştê elok û mirîşkan jî nema dan çêwîş û cendermeyên wî. Di tifaqiyê de hêza xwe û di hêza xwe de jî hinera xwe dîtin.
Zoravî bi dewlemendiyê daketin. Û hema hema hemû jî dewlemend bûn. Heso terektorek û texsiyek kirî. Circîs jî du texsî û terektorek. Di wê navê re zarokên wan jî xwendin û bi xwendin û xwendinê welatê xwe û miletê xwe nas kirin.
Reşo û Serdarê lawê Idrîs, xwendina xwe a li zanîngeha hiqûqê nêvcî hiştin û xwe li kurdayetiyê şidandin. Reşo ket nav ”Partiya Komunîstên Proleterên Kurdistanê
7
(PPKK)” û Serdar jî ket nav ”Partiya Kominîstên Gundiyên Kurdistanê (PKGK)”. Sarê xwendina Reşo bi xwe ne xweş anî. Bi sebeba ku Reşo çima ne bû pîlot, kirasê xwe çirand û got:

”Kûçik lawê kûçik, ji Sarê re qereqol fetih kirin, hi! şîrheramo,
heq û hiqûq û edalet û medaletê dixwîne, tirrr!
Wê di mehkeman de heqê mîhê li ba gur biparêze, bênamûs
lawê bênamûsan!...”
”Pîra delal, wilehî li kurdan pîlotî qedexe ye... ”
”Baş e, ma qey te nikarîbû mektêbên ku bombe û sîlehan
çêdikin jî bixwenda, hi!...”
Lawê Kenêr Restem û ê Erol Sînên zanîngeha tibê,
lawê Zibêr Aydin beşê edebiyatê û zimên û lawê Luqmên
Bişêr jî beşê metamatîkê xwend. Gelek xort jî bûn mamoste.
Bi kurtî, herêm ji xwendekaran tije bû û xwendekaran
gelek rêxistinên kurdî ên nihênî damezrandin. Bi damezrandina
wan re ji gundan berberî û li bajaran jî pêxwasî
rabû. Xelkê nema hev kujt. Her kes bi malê dinyayê daket.
Têkiliyên navbera xelkê, polîs û eskeran bi sînor bûn. Bêş
û xeraca esker û polîsan rabû. Li polîsxana Nisêbîne
êşkence her çiqasî bi temamî ranebûbû jî, bi êşkenceyê
kesek nema hat kuştin. Li qereqola Stilîlê û temamê qereqolên
gundan lêdan û çavsorî rabû. Çawîş û başçawîşan
xwe xistin çavên xelkê û ji gundiyan re gotin ”yoldaş!”
Başçawîşê Stilîlê Mustafa li qahwê bi zilaman re bi kaxetan
û Fatîme xanim jî bi xortan re bi gokê lîst. Vê jinikê
berî xortên herêmê, di xwe de şoreş kir. Gava bi xortan re
bi gokê dilîst, mirov digot qey li ber behra Mêrsînê bû,
tena derpî û bi sudyen dilîst...

8

BEŞÊ DUDUYAN

1

Sal 1977. Kelkela germa havînê ye. Rivîn ji taht û latan diçin. Bêhna êgir ji erdê tê, erd dikele; mîna ku agirekî mezin di binê erdê de hatiye dadan, di qelşan re pêtî dide der. Hawêrdor rewrewk girtine, leylan leylanê hiltîne. Pûş û pelax qemiriye û di bin lingên çûkan de dişike. Pişta zinaran bûne wek sêlek sor. Çûkan xwe berdane bin sîdaran. Zimanê kûçikan di tûlê de kişiyane; mirov tivingan berde wan ji cihê xwe dernakevin. Cil bûne pîşo. Ji rivînan bêvila mirov dişewite, bêhn dernakeve. Çirûskek dikare deşt û çiyê bişewitîne.

Heso tena bêceme û fanêreyê sertazî li ser kulêv di nav koma pizûriyan de rûniştiye û çayê vedixwe. Sê xortên bi çek derbasî odeyê bûn. Dudu jê bi demaçe, yek jî bi keleşkof e. Demaçeya yekî map a ê din astrayeke nehderbî ye. Yek jê simbêlbor, yek simbêlhej û ê din jî simbêlşor e. Şekalên hersêyan jî meqab in; bi çakêt û bi pantor in û li serê xwe jî çefiyên soringî pêçane. Yekî ji wan qazaxekî bi berstik li xwe kiriye. Ê simbêlşor bi qapût e jî. Qapût li qama wî a kin naxwe. Ne dikenin, ne digirîn. Madê wan ne tirş û mikûsî ye, lê pir jî cidî ne. Ji xwêhdanê bûne av. Serê zendika çakêtê xortê ku li ber derî sekiniye, şil bûye. Çavên wan di xwêhdanê de bûne bizot. Hilm ji serê ê pêşî diçe. Çavên wî jî terifî xuya dikin. Çend tayên xernûfê bi pişta çakêtê xortê qamqutî ve ye. Qilçixên simbilên genimî bi qeytana şekalên hemiyan ve zeliqîne. Stirû û qurîncek jî bi wan ve hene.

9

Çekdaran bi hevdu re gotin:

”Merheba ji civata we re!”
Civat tevxurcilî. Mela berî her kesî rabû ser xwe. Sadiq pêrgî wan çû. Heso dengê xwe bi ser ê civatê xist û got: ”Wey merheba û hezar carî merheba ji we re. Hûn di ser herdu çavên min re hatin. Kerem bikin rûnin. Temo, ji van xortên me ên delal re pêşî xwarinê û dû re jî çayeke giran bîne...”
Piştî ku şekalên xwe eskerkî rêz kirin, hersê jî li kêleka hev û li himberî Heso rûniştin. Ne çakêt û ne jî çefî ji serê xwe kirin. Xortê simbêlşor bi haweyê ku qêpût ji xwe bike, li ê simbêlbor nerî û di cih de jî berê xwe jê guhert. Qapût ji xwe ne kir. Çarmêrkî rûniştin. Zibêr çixare li ber wan gerand, Kenêr çeqmaq pêxist û Miho jî satileke av anî. Yekî ji wan çixare ne dikişand. Heso ew nas ne dikirin. Lê Mela Salar yek ji wan nas dikir.
Heso hinekî devê xwe cût û peyivî:
”Xortino li qisûrê nenerin, lê ez telebên bi sîleh nuh dibînim. Ma ev hûn ji kîjan partiyê ne, eyb nebe?”
Xortê ku simbêlbor bû bi haweyekî kemlan ew bersivand: ”Apo, em ji Partiya Komunîstên Proleterên Kurdistanê ne.”
”Wilehî navê we mîna ku hinekî bi min ecêb hat! Lawo li qisûra min nenerin, ez tiştekî di dilê xwe de nahêlim. Ez mirovekî deqarû me.”
Piştî ku xortê simbêlşor got, ”şoreşgerî ji xwe ev bi xwe ye, apo” û hema pê re li ê simbêlbor nerî.
Heso da dû a xwe:
”Wek we gelek partiyên telebeyan tên vir û diçin. Her

kes tiştekî dibêje. Îcar gelo hûn ê bi çi rêyê Kurdistanê ji bin zilma tirko xelas bikin?”
Xortê ku Simbêlbor bû, pêşî çep û rast simbêlên xwe firkandin. Dû re jî boqên simbêlan berjêr kirin. Lêva wî a qalind di bin wan de wek sefirneyekê xuya dikir.
”Em ê bi devê tivingê kurd û Kurdistanê xelas bikin, apo!...”
Wî xwest ku dirêj bike, lê Heso rê nedayê. Gelek caran li ên wek wan guhdarî kiribû. Dizanîbû ku gotina wan nebire, ew ê bibêjin û hey bibêjin.
”Ev baş bû. Rast e, ku ne bi devê tivingê be, tiştek safî nabe. Ma lawo navê serokê we çî ye?”
Xortê Simbêlşor:
”Apê Heso, navê serokê me Circîs Bîtîren e, lê em jê re dibêjin Reyis.”
Heso wek hespê ku ji mêr bicefile, rimekê bilind bû. Çavên wî wek du tasan vebûn. Sênga xwe heta bi çongan tewand, serê xwe ber bi wan de bir û rakir:
”Te go çi yabo qurbano? Te go çiii?”
Çekdaran di cih de fêhm kirin ku navê serokê wan li hesabê Heso ne hatiye. Ji nişkê ve veciniqîn, çavên wan lîst û li hev nerîn. Lepta wan ji çavên civatê ne reviya. Zibêr di ber xwe de beşişî û li hindurê kefa destê xwe ê rastê nerî. Ji bo ku xwe bigire û nekene tîtikî eniya xwe xurand û ruyê xwe gewirand. Dû re jî zimanê xwe ê şilek heta bi qurm kişand, di kefa destê xwe de bir û anî û bi tiliya xwe a işaretê kefa xwe firkand. Wî çiqasî firkand, taxên

qilêrê jî ewqasî di kefa wî de civiyan. Qilêr mîna şihîran dibirî û diavêt dera han. Mihoyê enîdoq bi deng keniya, lê bi awira ku Sêdiq tê firand devê xwe girt û bi hêdî pala

11

xwe da dîwêr. Nûriyê serşûnikî ji bo ku nekene firînî bi bêvila xwe xist, daxist zengelorkê, bi teqil avêt serşokê û li pelxema xwe nerî bê ka çawa diçe. Karê vî wilo dikir. Li mala walî jî rûnişta, miheqeq ew ê dîsa tifî derekê bikira. Tifkirin bûbû xurek û ketibû devê wî. Şêxmûs serê xwe berda ber xwe û nav pişta xwe xurand. Kazim ruyê xwe tirş kir û kabokên xwe xistin zikê xwe. Lê Qaso mîna şêxekî, kemlan rûniştibû. Xelef dîsa xwe ji bîr kiribû, bi fanêreyê xwe ê sertazî li odeyê rûniştibû û her ji kêlîkekê bin çengên xwe difirkandin. Dîsa fişke fişka Simo bû. Ji aliyekî ve bi berçavka xwe a ku di gêrê de bikar dianî, dilîst û ji aliyekî ve jî habela bêvila xwe paqij dikir. Hema hema her tiştê vî mirovî ji qiyasê derbûn. Heta bi nexweşiyên wî jî. Gundî bi bapêşê, ew bi pîrwê diket. Kuxuka wî a ”Hawa” bû. Li vê herêmê pizika ”Peto” bi tenê di kulîmeka wî de hatibû. Kerîmê ku di bêdengiyê de bi serketî bû, tevnediqeliqî. Selîm mîna hespê ku mêşik bike, her ji bêhnikekê stuyê xwe li hev dizîvirand, lêvên xwe dicûtin û diranên xwe bi ser hev de diqiriçandin. Çend roj berê li ba qereçiyên ku li gund danîbûn du diranên xwe ên pêşî çêkiribûn. Qereçiyan li ser diranên wî bafûn pelixandibûn û bi hesabê ku jê re diranên zîv çêkiribûn, tofaneke pere jê stendibûn. Hemo wek keftarekî bêdeng sekinîbû. Mela Salar bi haweyê ku wan bêisûliyek ne kiriye kenekî

qîç kir û dengê xwe hilda:
“Apê Heso xort dibêjin ku serokekî me heye. Û di baweriya min de ev jî tiştekî pir bedew e. Xebat û tevgera bê serok wek pezê bê şivan e, ma ne wilo ye?”
Heso piştî ku tibabekî bêdeng sekinî, bi haweyê ku rîha xwe a demekê şeh bike, temamê tiliyên xwe wek mel-
12
hêbê bi kar anîn û li ser ruyê xwe ê şahîk gerandin. Di sala ku esker û polîsan li Nisêbînê Kazimê dêrcemî di mala wî de kuştibûn û termê wî avêtibûn nav mayinan, Heso jî bi milama ku term nebe nêçîra wawîkan, deh hezar wereqe bi xwe re hilanîbû û xwe avêtibû tor û bextê yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê. Yuzbaşî jî piştî ku pere berdabûn bêrîka xwe, hişk bi rîha wî girtibû û li dor bîst deqîqeyan ew li erdê gevizandibû. Heso pir li ber xwe ketibû. Bêhnçikyayî hatibû gund, li ba Sarê çewalek xeber ji Şêx Mahsûmê xiznî re dabûn û bi hevringê kişiyabû ser rîha xwe. Di eslê xwe de wî hîç ne xwestibû rîhê berde; lê ji ber ku dilê Sarê bijiyabû rîha Şêx Mahsûm û rîha wî jî şibiyabû a şêx, rîh berdabû. A wî hemû ev bû.
”Helbet wilo ye seyda helbet, tevgereke miletî bê mezin û sermiyan nabe. Xortên me ên telebe bi aqil in...”
Dema ku Heso dipeyivî, ji kortika qirikê deng dida û giraniya gotinan di qeweta zend û bendan de bi kar dianî. Herdu destên xwe bi teqil dihejandin. Xortê simbêlbor bi zorê xwe beşişand û çefiya xwe ji serê xwe kir. Hema bi wî re herduyên din jî çefî ji serê xwe kirin. Wî, bi haweyekî kubar peyva Heso birî û peyv ber bi dereke din de gindirand.

”Dewleta tirkan dijminê riknê miletê kurd e. Kurdistana bav û kalan kirine çar perçe û bi her haweyî welatê me talan dikin; me dikujin û me di heps û zindanan de dirizînin. Namûs û şerefa xelkê me avêtine bin lingên xwe û insanên me bêşexsiyet dikin. Van tirkan em kurd anîne dereceke wisa ku em ji ber kurdbûyina xwe fedî bikin û li doza xwe xwedî dernekevin!...”

Salar piştî ku got ”birayê me ê Şoreş rast dibêje, em bi

13

miletî divê li ber xwe bidin”, çixareyeke qalind dirêjî destê wî kir.

Şoreş jî di cih de gotina xwe qut kir û bi rêz rabû ser qerevîzkan, ”tu tim û tim hebî, destê te sax be seydayê delal”, got û ji cihê ku lê sekinîbû dewam kir:

”Kurdistan 700-800 sal e ku di bin darê zilma tirkan, ereb û farisan de dinale! Êdî bes e bes! Heta kengî em ê ji vê xewa mirinê şiyar bibin; di bin seroketiya Reyis de cihê xwe ê bi namûs û şeref bigirin û şerekî serbilind bi tirkteresan re li dar bixin!...”

Şoreş xwe berdabû ser kabokan. Destê xwe ê çepê mirtal û ê din jî mîna gurzekî dihejand; dengê xwe bilind kiribû û bi hêrs di cihê xwe de diqeliqî.

”Em kurd ne xwediyê xwe û tiştekî ne. Dest danîne ser her tiştên me. Heta bi namûsa me, yanî jina me ne a me ye. Di êşkencexaneyan de dest avêtin gelek gelek keç û jinên kurdan. Li êşkencexaneyên Riha û Diyarbekirê polîs tecawizî zarokên pazdeh-şazdeh salî dikin. Ma qey bi tenê li van herdu bajaran vê bêexlaqiyê dikin! Li temamê Kurdistanê

eynî tiştî dikin. Li van gundên ber hidûd eskerên
wan her tim ketine ser zikê pîrek û zilamên kurdan. Tirk
miletekî zalim û bêexlaq in. Em ê bi devê tivingê vê heyfê
ji wan hilînin...”
Hûto kire niçe niç:
”Xalê telebe çaya te sar bû, pêşî çaya xwe vexwe û dû
re ez jî bi we re û em ê bigirin ser qereqola Stilîlê. Ma te
got çi xalê Sadiq?”
”Wilehî tu baş dibêjî Hûto. Lê em hîn bi qasî te û xalên
te ên telebe bi namûs ne bûne...”
Civat bi gotinên Hûto û Sêdiq keniyan û her kesî ji xwe
14
re tiştek got. Heso dengê xwe bi ser ê hemiyan de rakir û
bi qerf ji Temo re got:
”Kuro zû here bangî wê eskerdijmina pîra dêya xwe
bike û bibêje ku sê hevalên te li odeyê rûniştîne!”
Şoreş bi gotinên xwe ên step û girover serdestî civatê
bûbû û bêwestan yek ji yekê pêdixist. Mirov digot qey
Kurdistana wî ketibû tûrik û tûrik jî di nav lepên gundiyan
de bû; tûrik bistenda her tişt diqediya.
Ne hişt ku Heso gotinê dirêj bike, bi lez çixareya xwe
a sisêyan jî pêxist û dîsa dest pê kir:
”Îro li dor nod milyonî kurd hene û tev de jî xulamtiyê
ji tirkan re dikin. Bajarên Tirkiyê hemû li ser milên kurdan
hatine ava kirin. Çopçiyên wan, hemal, sefar, kurtanker,
dirûnker û heta bi bekçiyên li ber devê deriyê bar û pavyonên
wan jî ji me ne. Zir welatekî wek Kurdistanê ku bi
sererd û binerdên xwe dikare temamê dinyayê bi xwedî

bike, talan dikin û heqê semsariyê bê çî ye nadin xelkê me! Insanên me bi nan û zikê di karên xwe ên herî bi qirêj de dixebitînin. Li bakurê Kurdistanê li dor şêst milyonî kurd bê doktor dijîn. Ez ji we re dibêjim, hema li bajarekî wek Nisêbînê ku hejmara bajêr digihê heştê hezarî, çend doktor hene? Bi tenê du doktor hene. Yek jê omerî ye û ê din jî ji gundê Reyis e. Û herdu jî hevalên me ne...”
Civat di bin tesîra gotinên wî de bêpêjin rawestiyabû.
Her kesî bêhnekê mîna ku xwe ne tiştek bibîne, serê xwe berdabû ber xwe û bi baldarî li Şoreş guhdarî dikir. Ode ji zilaman hatibû dagirtin. Ji pizûriyan bêhtir hûrî di civatê de rûniştîbûn.
Dema ku xwendekar dihatin gundan, hin gundî ji dil û can û hin jî ji tirsa ku zerarekê ji dest wan nebînin, li wan
15
vedihewiyan. Xwendekaran ne dihişt ku gundî problemên xwe bibin ber destê esker û polîsan. Problem di nav xwe de, carina bi darê zorê û carina jî bi xweşî safî dikirin. Bi gotinên xwe ên xweş û ne xweş û tevgera xwe a civakî, hilfa gundiyan kişandibûn ser xwe û pêşengî ji wan re dikirin.
Şewqedîn çaygerî dikir. Meyroyê dîsa xwe ji bîr kiribû û du-sê kel li çaya xwe xistibûn. Digel ku çaya wê tenik xuya dikir dîsa jî mirr bû.
”Lawê min, çaya te ne xweş hatiye; here çayeke nuh li êgir bike”, Heso got û ziq li Simo nerî.
Sîrac û Simo di ber xwe de bi hev re dipeyivîn. Û ev yeka ha jî ji ber ku mêhvan rûniştîbûn, şerm bû. Simo di

bin tesîra awirên Heso de bêyî ku bi fikire bê çi dibêje, a
di dilê xwe de got:
”Herçi telebe ne dixwazin her tiştî bi hev re bibin serî.
Ev ne tiştekî baş e. Ji ber ku bi her tiştî dizanin, îcar tiştekî
jî nizanin; rê nabin ser tiştekî...”
Kenêr rê lê girt:
”Simo dixwaze bibêje ku gava mirov bi carekê ve
gelek karên mezin dan ber xwe, mirov çendî zana be jî
mirov wê heq jê der nekeve...”
Xortekî bêhnçikyayî xwe avêt hindur:
”Çar cendirme tên gund!”
Çavên tirsê dijwar bûn. Sahwa wê jî. Hersê çekdar bi
hev re çeng bûn wê navê û bi nav şekalan de pengizîn.
Civat bi wan ve rabû. Heso bi ser her kesî de hilbû:
”Sîleh mîlehên wan veşêrin û wan jî bibin aliyê malê!
Zû, wek ku ez dibêjim bikin; gotinê nekin dudu!”
Wilo kirin. Telebeyan jî wilo xwestibû, lê ji xwe fedî
16
dikirin. Li gora zihniyeta partiya wan, şerm bû ku çekên
xwe teslîmî gundiyan bikrana û xwe ji ber eskeran veşartana.
Çar cendermeyên ku ji Stilîlê dihatin, binya gund jî
derbas kiribûn; berê xwe dabûn ser rêya Menderê û bi lez
diçûn. Pêjina mirovê ku birayê xwe kuştibû, li Çûva kiribûn.
Doh jî çûbûn Sarincê. Her roj li gundekî bûn.
Sarê bi çavên xwe ên kul ketibû ber tifikê û dista goştê
ku ji mêhvanan re li êgir kiribû tevdida. Qurmiza ku li derdora
çavên wê vedabû, ji dera han xuya dikir. Bêhna goştê
wê heta bi hindurê odeyê diçû û di bêvila civatê de dixulxulî.

Çekdaran xwêzî li ser xwêziyê dadiqurtandin. Seyrê
di bin çavan re li pelikên xizêma xwe a zêrînî ku bi bêvila
wê ve dihejhijî temaşe dikir. Pûç û vala bi dapîra xwe re
dipeyivî û morîkên xwe bi dar ve dikirin. Meyroyê di bin
banê beragirkê de birxul werbêj dikir. Xelîl her ji bêhnikekê
li dêya xwe dinerî û ji nişkê ve tiliya xwe li tuka şîrê li
ser êgir dixist. Zarokên cîranan li dor wan bi çavgirtînkê
dilîstin û li beroşa Sarê dinerîn. Hûto her kêlîk derdiket
hewşê; pêşî ziq li Sarê dinerî û dû re jî hildikişiya ser xênî.
Garan li nav pirêzên binya gund mexel ketibû. Keçikan ji
bo ku dewar rêx bikin, tihêlên dewaran dixurandin. Di nav
keçikan de Sosinê pir jêhatî xuya dikir. Him kozîdana xwe
ji a her kesî bilindtir kiribû û him jî nîvê kozîdanê ji serkulan
dagirtibû. Komek zarok jî di nav garanê de habela li
keran siwar dihatin û bi vir de û wir de ker dibezandin.
Pîrek li herdu qumaşfiroşên ku li navtara gund sekinîbûn,
civiyabûn û qîje wîja wan bû. Karê van pîrekan her ev bû.
Nizanîbûn bi hêdî bipeyivyana. Ji xwe gava ku etar dihat,
bê bêlo me be! Circîs bi tena serê xwe li nav pirêzên rohi-
17
latî gund sap dida ser hev. Pîra Hilalê jî hinekî ji wî bi dûr
li qelêç, bi xilçê xwe dîsa raserî moristanekê bûbû û genim
ji moristanê derdixist. Cêzên genimê şeqilkirî ên li ser
bênderên jêr, ji kîlometreyekê xuya dikirin. Mitirban girtibûn
dora cêzê, yekî ji wan û Hesûk destê xwe pir dihejandin
û dipeyivîn. Dengê kûke kûka kundê ku ji nav rez
dihat û li ser gund belav dibû, Circîs ji şêl û qewetê dixist;
her ji bêhnikekê berê xwe dida nav rez û dû re jî bi haweyê

ku istixfara xwe dianî li ezmên dinerî.
Necîm û Xelef di kêleka hev de rûniştîbûn. Piştî ku herduyan di kerika guhê hev de kirin piste pist, Necîm bêhnekê li Heso nerî û berê xwe da hersê çekdaran:
”Wilehilezîm heger telebe hemû wek we bin, em ê kambaxiyê berdin dewleta Romê û Kurdistana xwe di bîst û çar seetan de ji dest wan derxînin. Di vî gundê me de jî telebe hene, lê yek jî wek we nabêje ezbenî. Hûn pir dilşewitî xuya dikin!”
Bedranê hûrî mîna ku ji berê de fikirîbû bê wê çi bigota; çavên xwe kutkutandin û sivik peyivî:
”Serdarê me jî wek wî got û got heta ku ew ji mektebê avêtin. Erê kuro, salek ji ebûkatiya wî re mabû!...”
Gotina wî li hesabê Zibêr ne hat.
”Ma ne wilo li serê Reşoyê me jî kirin. Ê ne bê wê çi ebûkatê mezin jê derketiba!”
Xelefê devkasikî xwe di ber Zibêr re rakir, lêvên xwe lebitandin û berê xwe da çekdaran:
”Birano, ez hêvî dikim ku hûn ê li qisûra min ne nerin, ma gelo tenq û top û teyarên we jî hene?”
Şoreş li hevalê xwe ê simbêlhej ku di kêleka wî de rûniştîbû nerî û bi hêdîka ew niqurçand. Xure xur ji nava
18
wî dihat. Hin ji civatê di ber xwe de pê dikeniyan.
Birçîbûyin mercekî telebeyan bû û Reyis jî ev merca han tam bi kar dianî.
Sarê li gora adetên xwe çûbû. Heger bizanîbûya ku telebe birçî hatine mala wê, ew li bendî goştê li ser êgir ne

dihiştin, çayê ne dişand odeyê û di hilm û pifekê de wê ji wan re goşt bibiraşta. Telebeyan digel ku çar-pênc şekir diavêtin qedeha xwe, dîsa jî birçîbûyina wan ne dişikest.
”Apê delal, ‘emperyalîzm pilingekî ji qertonê ye!’
Gava ku gelê me rabe ser pêyan, ma tenq û top û teyare li ber çi ne!” got û awirek dijwar di hevalê xwe de firand.
Hinavên hevalê wî ji destê xwarinê mîna coka êş deng dida. Di dawiyê de xwe ne girt, rabû ser xwe û berê xwe da hindama kêzînê. Çend zilam pê ve rabûn.
”Hevalê Çiya bi ku de?” Şoreş got û ziq li devê derî nerî. Bêhna goşt zêde dihat.
”Ez dixwazim avekê vexwim.”
Miho bi lez çû ber serşokê û tas da ber cerê avê. Heso devê xwe dagirt û serê xwe bilind kir ku bipeyive, lê di ber xwe de peyivî:
”Bê çiqasî bi terbiye ne, ew bi xwe radibe avê ji xwe re tîne. Li dor du seetan e mîna feqeyên ku derzê ji seydayê xwe distînîn, bi edeb rûniştîne û wek camêran bi civatê re dipeyivin. Eferim ji we re”, got û libên tizbiya xwe hêdî bi hêdî kişandin.
Luqmên bi şerqe şerqa tizbiya xwe bala çekdaran kişandibû ser xwe. Çavên wan ji her kesî bêhtir çûbûn ser wî. Ristika heqîqeyên di stuyê bûka xwe de wek tizbiyê bi kar dianî. Gava ku tizbiya xwe a nîv metreyî di kefa destê xwe de dicivand, pê dilîst û hildida, mîna ku birek jin û
19
mêrên stenbolî bidin camcamkan, şeqe req bi hindurê odeyê dixist. Luqmên piştî ku tizbî sê caran li ser hev

hilda, di nav destên xwe de bir û anî û eciqand, bi serê tiliyên lingê xwe ê rastê girt û peyivî:
”Erê ma ne ji xwe, em û dewleta Romê hîn ji dema Îsa û Mûsa de dijminê hev in. Telebeno, ez çere mere nizanim, heger hûn bi a min bikin hema hi ihi, xwe bidin ser hev û em ê êrîşî ser van kûçikbavên eskerên qereqola Qesra bikin. Ma ji vir û pê ve! Ma kê ji me bîra ku rojekê wê xortên me kurmancan rabin ser xwe, bên heta ber lingên me û doza ku em şer bi qûncilikan re bikin, dibir ha!
De werin lawo, îro roja me ye. Hema heçê ku ranebe, çarika jina wî li serê wî be û hew!”
Luqmanê ku hinekî ziktelêrî bûbû, bi hinc tizbî li erdê xist, destê xwe li sênga xwe da û rabû ser xwe:
”Kuro Nezîro! Zû wê devzirava bavê xwe bîne” got û di hindurê odeyê de çû û hat.
Heso xwe ji dil aciz kir. Gotina lawê wî a bi vî haweyî bi ezbeta hûran re dikarîbû bûba sebebê nexweşiyeke nuh. Di odeya wî de ji malbata hûran hin xort û zilamên ku ji Luqmên kelgermtir bûn, rûniştîbûn. Heso berî her kesî li xwe qewimand û bi zirt got:
”Kûçik lawê berazan, bitebite û wek insanan li cihê xwe rûne! Ji xwe re lê binerin bê çi zir zilam e û heyvanê aqil di serê wî de tuneye, kuro! Hûto, binere bê tu çend parsuyên wî naşikînî!...”
Hûto tu carî gotina Sarê û Heso li erdê ne dixist. Wan jê re çi bigota wî dikir. Lê gava dihat ser a dawî, gotina Sarê jî ne dida bi a Heso.
Hûto ji nav şekalan pekiya, Luqman xist ber sênga

xwe, zendên xwe lê rapêçan û ew bi ser hev de guvaşt.
Barînî bi Luqmên ket û civat bi wan ve rabû. Hûto guh
neda tu kesî, Luqman avêt erdê, li ser pişta wî rûnişt û
qêriya:
”Xalê Heso, ma ez çi bikim jê?”
”Wî ji hindur biavêje, nehêlê bê civatê û hew!”
Hûto wilo kir.
Mîna ku cenderme di ber Şoreş û hevalên wî re derketibin,
behetî mabûn. Çîrokên li ser dêwan ji dapîr û
bapîrên xwe bihîstibûn. Ji wan re hatibû gotin ku gava
dêw radiketin, dar û devî li ber hilma firnikên bêvila wan
dihejhijîn. Dema ku dipişkiyan ji silûmên çiyan kevir û lat
digindirîn. Û dema ku hêrs dibûn, diqêriyan û êrîş dikirin,
erd û ezman dihejiya û dinya di nav toz û tirabêlka lingên
wan de winda dibû. Li ber çavên wan du dêwan li ser gotina
pîremêrekî hejhijî girtibûn hev û dîsa li ser gotina wî
dev ji hev berdabûn.
Çiyayê diyarbekirî serê xwe berdabû ber xwe û ji kûr û
dûr difikirî. Hemo û Bedrên kevir bi ser dawa Luqmên de
berdidan û berdilê Heso digirtin. Çiya ji nişkê ve serê xwe
rakir û herdu destên xwe ber bi zikê xênî de bilind kirin:
”Gava ku gelê kurd di bin seroketiya Reyis de bibe
yek, tu hêz wê nikaribe pişta wî bide erdê. Temamê emperyalîstên
dinyayê bi fize, tenq û top û teyareyên xwe êrîşî
ser me bikin jî, êm ê karibin bi wan. Gelê me dêwekî hevt
serî ye, seriyek here wê seriyê din têkeve dewrê û dinyayê
bi ser serê dewleta tirkan û emperyalîstan de xirîxopan

bike!...”
Qaso teşkên xwe radabûn; xwe berdabû ser enîşka
rastê û bi dizî ji Sêdiq re digot:
21
”Ev çi dibêje, hişê min nakişîne? Tiştê ku ez dizanim li
Îranê faris, li Iraqê û Sûriyê ereb û li Tirkiyê jî tirk dijminên
me ne. Îcar ev emperyalîst kî ne?”
”Hey agir bi mala bavê keto, ev tu çiqasî fêhmkwîrî yî!
Ma Reşo, Serdaro, Bişaro û Sînano hindik carî ji me hemiyan
re gotin ku di eslê xwe de dijminên me ên herî mezin
emperyalîst in.”
”Ero kuro lawo, ev emperyalîst axa ne, beg in, terempêl
in, hesp in çi tebane ne, weh!”
Sadiq beşişî:
”Ji Emerîka û temamê Ewrupayê re emperyalîst tê
gotin.”
”Na loo! Bavê mino heger emerîkî jî dijminên me bin,
bi telaq wê yeka me nebe dudu” got û hinekî dengê xwe
hilda.
Lêbelê civatê fêhm ne kir bê li ser çi dibêje.
Osmanê çîmteşî ji Sêdiq pirsî:
”Tu mirovekî ku xwe li tiştan diqelibînî û tu bi gelek
meseleyan jî dizanî. Îcar lawo ev telebeyên me ji bo van
urûsan çi dibêjin gelo?”
”Apo, bi Xwedê di vî warî de min jî tiştek ji wan fêhm
ne kiriye. Her ê ku tê bi haweyekî ji me re tiştekî dibêje.
Tew hin ji wan dibêjin ku pêşî divê em şer bi urûsan û dû
re jî bi emerîkiyan re bikin heta ku em bikaribin dewleteke

kurdistanî ava bikin.”
”Eeehew lawo, ev niha tu bi rastî dibêjî lo! Ma birazî qey em Tecal in ku temamê dinyayê wê bibe dijminê me û me biricimîne! Heger bi rastî wek ku tu dibêjî wilo be, em bibin Restemê Zalê jî em ê nikaribin bi wan”, got û bi qahr destê xwe dirêjî qutiya Remo kir.
22
Xelef dengê xwe rakir:
”Sadiq ew çi pine pina we ye lo? Birayên me ên telebe rûniştîne, bihêlin ku em ji wan tiştekî ji xwe re hîn bibin. Heger hebe tiştekî ku nekeve serê te û Osmên, kerem bikin ji birayê me ê Rûreş bipirsin.”
Heso bêyî ku bikene:
”Xelef, Rûreşê çi kuro! Navê wî Şoreş e, ma te hişê xwe xwariye, weh!...”
”Na loo! Ê hema bi tirba bavê te kim, heta niha min digot qey navê vî birayê me Rûreş e. Yabo ez çi zanim, ez navekî wilo hîn nuh dibihîzim. Ev telebeyên me jî bê çi ecêb in kuro, bê kê bîra ku mirov navê xwe bike Rûreş, dibir!...”
Dasim xwest ku ber bigire, lê ji wî xerabtir kir. Mêrik him devkoxî bû û him jî bi serê zimên û di nav qelşikên diranan re dipeyivî. Ji ber hindê jî tîpa ”Ş” heta ku ji devê wî der diket, dibû ”S.”
”Xwedê jê raziyo navê wî Sores e, Sores!”
Zibêr ji her kesî bêhtir pê keniya:
”De îcar ji xwe re li turlî binerin, hi! Wek turliyan dipeyive kuro.”

Dasim bi qasî tayiyekî zirav û dirêj bû. Mirov digot qey di hestiyê laşê wî de mejî tune bû; ji nanê tisî û girara rijî pê ve xwarin ne dixwar. Bi pifekê dikarîbû biketa. Gava ku xwe berdida navtarên gund, wek mêşa ku li ber bayê kur bikeve, bêserî bi vir de û wir de disûrikî û diçû. Di ser çilî re bû, lê li gora salên xwe belkî di ser pêncî re jî xuya dikir. Çepildirêj û çavşînî jî bû. Heger ne ji lingên wî ên tapanî û bêvila wî a dirêj ba, belkî jinebiyan ew wek çelengekî mêran qebûl kiribana. Lê dîsa jî ne ku ji dûr ve

23

lihevhatî xuya ne dikir. Ên ku jê hez dikirin hebûn.

Sadiq beligoşka guhê xwe xurand û dengê xwe hilda:

”Jinikê mala wî xerab kiriye, him her şev wî berdide ser xwe û him jî ji nan û dew û meyirê pê ve tu kerafiyê nadêyê. Helbet wê bi qasî turliyekî bibe û mîna turliyan jî bixutxutîne, bavê mino...”

Piştî ku Dasim got, ”ê hema bi telaq ez bi qasî te nakim, lê ma lawo ez çi bikim, Xwedê ez wilo çêkirime” û bi haweyê ku alîkariyê ji Remo bixwaze lê nerî.

”Tu rast dibêjî, Sadiq mirovekî fahl e; hîç yextiyar nabe. Erê kuro, mêrik belkî pêncî sal jî kiriye û tayekî sipî bê çî ye hîn ne ketiye porê wî.”

Şoreş di temamê jiyana xwe de nuh beşdarî nav civateke wilo ewqasî vekirî û xeberokî bûbû. Şaşomaşî li dor xwe nerî, fedî kir û serê xwe berda ber xwe. Heso ev aliyê wî ferq kir:

”Dev ji qeşmeriyên xwe berdin û li van mêhvanên me ên ezîz guhdarî bikin...”

Dasim ji Osmên re rêya peyvê vekiribû. Osman mirovekî fedîkoyî bû, di civatê de heta ku peyv ne hatiba ser û zorî lê neba, zû bi zû ne dipeyivî. Dema ku rîhsipiyên gund ji jina wî re digotin ”Pîra Gulê, ma ji te û vî pîrê me, kî ji we diçe ser kê?” Wê digot ”kuro bi telaq ji wê roja ku min ew kiriye û heta niha, her tim wî xwe xistiye bin min û me ew tişt kiriye. Mêrik xerabe ye, heger min jî xwe wek wî kiriba, dûnde bi dû me ne diket.”

Osmên piştî ku dev û ruyê xwe firkand û du caran li ser hev xwêziya xwe daqurtand, wek zarokên ku li şekirê di destê mêhvanan de binerin û fedî bikin rahijênê, li çekdaran temaşe kir û ji Dasim re got:

24

”Dasim, hema bi Xwedê nakeve serê min, eva ku em ê bikaribin bi temamê dinyayê re şer bikin.”

Xelef qube peyivî:

”Berî her tiştî hema bi kêmanî divê sê-çar teyareyên me hebin. Mirov wê çawa bikaribe bi tiving û çifteyan şer bi tenq û top teyareyan re bike! Yabo bi Xwedê nakeve serê min ku em ê bi vî halkê xwe bikaribin şer bi dewleta Romê re bikin!”

Selîm xwe bi ser hev de qurmiçand û di ber xwe de got:

”Hema teyareyekê bidin min û bila evqase dinya rahije tiving û keleşkofan û bên min, bi telaq ez ê hemiyan bikujim!”

Simo piştî ku got ”mirov nikare bê teyare bi ordiyan re şer bike”, Heso peyivî:

”Elîkê Betê bi neh-deh hezar peyayên xwe ve bi

tabûrekê re serî dernexist. Çima hûn ê bibêjin, ji ber ku di destên eskeran de top û cebilxane û di destên ên me de jî çend tivingên kurmancî hebûn. Çifte nikare bibe himberê tivingê, ma bi tirtirê ye qey! Divê hin dewlet bi tenq û top û teyareyên xwe alî me kurmancan bikin, yana şer bi tirkan re nabe."

Hemo bi hêdîka tiliya xwe gihand bûka ku di kanîka çavê wî ê rastê de hatibû, çav girt û bi çavekî peyivî:

"Romî zalim in, dilê wan bi tu tiştî naşewite. Gava ku me kurmancan bê sîlehên herî mezin li xwe qewimand, wî çaxî ew ê jî qismê me ên nêr hemiyan ser jê bikin û ji dinyayê kinêsa me kurmancan bitefînin. Telebeyên me xort in, zilm û zora tirko hîn ne dîtine!.."

Kenêr ji cihê xwe hilqevizî û destê xwe hejand:

"Tu rast dibêjî Hemo, tirk kafir lawên kafiran e! Di

25

dinyayê de ji tirkan pîstir mexlûq tuneye! Kalikê min bi xwe jî digot, di serhildana Şêx Seîd de eskerên tirko bi hezaran zarok û pîrekên kurdan him ser jê kirine û him jî şewitandine!"

Ji ruyê Şoreş ê vemirî xuya dikir ku ne li bendî gotinên wilo bû. Keserek veda û tiliya xwe a girdekê li ser movikên tiliyên xwe ên destê çepê gerand. Movik di destên wî ên piçûk de bel dixuyan. Bêyî ku serê xwe bilebitînê çavên xwe li ser civatê gerandin bê ka civat dixwaze dîsa ew çi bibêje. Pîremêr li vê raberdana wî hayî nebûn, bi haweyê bûblankî bi hev dikeniyan û diwenisîn. Koma xortên ku ji qorziya dîwarê rohilat û heta devê deriyê odeyê

seranser girtibûn, eskerkî rawestiyabûn û temamê hişê
xwe berdabûn ser keft û lepta çekdaran. Ji bo wan jî ji xwe
ew girîng bûn. Xort motorê şoreşê didîtin. Şoreş bi xortan
dibû. Li gora zihniyeta wan gotinên bav û kalan, mîna berberiya
ku bi sed salan bi hev re kiribûn pûç û vala bûn. Ji
ber ku ji zarokên xwe re jiyaneke bi rûmet pêk ne anîbûn;
temenê xwe di fitne û fesadiyê de bihurandibûn û malên
xwe li devê esker û karmendên dewletê qelibandibûn,
hemû jî gunehkar didîtin. Û di rojekê de jî divabû cezeyê
gunehê xwe bikişandana. Eskerî ji tirkan re kiribûn û di
ber tirkan de hevdu kuştibûn. Welatê xwe pêşkêşî dijminan
kiribûn û bûbûn xulamên wan. Dewlet bi qasî çiyayekî
bêper mezin û xwe jî bi qasî girikekî piçûk dîtibûn.
Çekdaran li der bi çavekî xayinane li bav û bapîran dinerîn
û di civatan de jî xwe ji wan re dikirin erd.
Şoreş, ji bo demeke kurt be jî gihabû armanca xwe. Di
odeya Heso de dîwarê partiya xwe bilind kiribû. Hin xort
ketibûn bin tesîra wî û xwe ji temamê kar û barê wî re
26
amade kiribûn. Dilê bav û bapîran bi carekê ve reş bûbû û
heyvanê îmanê bi wan re ne mabû, êdî ji xwe hîç pêwîst
ne dikir ku ew bi xwe bipeyivya. Dîsa jî xwe ceriband ku
çend gotinan bibêje, lê ne got. Bêhnekê serê zimanê xwe
cût û pişta stuyê xwe xurand. Xwêhdana ku bi serê wî ê
qilêrî ketibû ziwa bûbû. Porê wî ê reş û xelekî mîna pirça
gîskekê li hev geriyabû. Bejindirêj û piştqopî bû. Ji nêza
zikê wî gihabû pişta wî, pişt lê bûbû gopal. Ji toz û tirabêlka
ku li ser eniya wî tax girtibû, pitikên di eniyê de xuya

ne dikirin. Ji qertaya mûyên di hinarkên ruyê wî de dida der ku Şoreşê qosarî, mûçink bi kar dianî. Mû reş û geş û qalindî bûn.
”Hevalê Zinar, ji kerema xwe re de ka hinekî jî tu bipeyive”, got û bi simbêlên xwe lîst.
Li gora zihniyeta wî jîr û zanayî bi mal û maldariyê li pêş diket. Mirovekî ku di kuçan de mezin bûbû, nikarîbû wek yekî ku di serayan de mezin bûbû jîr û zana ba. Mêrê gundî bi qasî ê bajarî bi aqil ne dihat. Şoreş û hevalên xwe bi van hemiyan dizanîbûn. Digel ku terektor û texsiyên zoraviyan li ber çavên wan bûn, dîsa jî ew kêmaqil û bêaqil didîtin.
Zinarê batmanî jî mîna havizên ku li mizgefta Nisêbînê bi bîst-sîh wereqeyekî cizweke Quran dixwendin, çavên xwe girtin û devê xwe vekir:
”Emperyalîst tirsonek in, ji ber ku zalim in. Mirovên zalim hemû jî tirsonekî ne. Gelê Viyetnamê û Kubayê bi darikên zilan, melhêb û sêgulîkan tenqên wan ji derb dixistin; bi qewsik û koçanîkan êrîşî ser topan dikirin; bi çifte û tivingên kurmancî teyare ji ezmanan dianîn xwarê. Pîremêran di meydana şer de xwe li himber bombeyên
27
emerîkiyan dikirin mertal û xortan jî bêmefer xwe di kemînên wan de werdikirin...”
Remo beşişî û bi qerf got:
”Wey bavo! Bê kê bîra ku kurmancên me herin heta bi wan welatan, dibir lo!”
Sêdiq av li aşê wî kir:

”Erê kuro, em di destê qûncilikan de hiştine û çûne ji
xelkê re tiving çêkirine(!)”
Zibêr fêhm kir ku Remo û Sadiq qeşmeriyên xwe bi
Zinêr dikin.
”Yabo mû bi serê zimanê min ve şîn hat hingî ku min
li ser van bav û kalên me ên xerabe got. Mêrikan ne tiştek
bûn, ma bi zorê ye qey! Em di destê tirkteresan de hiştine
û çûne ji Vîta û Kuda re tiving û bombe çêkirine, kuro”,
got û berî her kesî ew bi gotinên xwe hêriya.
Civat bi gotinên Zibêr hîn bêhtir keniya. Lê çekdaran jî
bi haweyê ku Zibêr ji ehmeqiya xwe tirto-virtî peyivîbû,
fêhm kirin. Devjenga bi vî haweyî li hesabê Şoreş hatibû.
Li gora wî civat cahil bû û mirovên cahil jî bêfikar dipeyivîn.
Ji cahiliya civatê cesaret girt û di ber xwe de bi dizîka
ji hevalê xwe re got, ”bi vê tempoyê dewam bike.”
Hevalê wî jî bêyî ku bifikire tam da nav stiriyan û bi
vir de û wir de xwe çeng kir:
”Îcar ê me tew di destên me de ne çifte, qewsik û mewsik,
keleşkof, bombe û sarox hene. Kurdistan tije keleşkof,
demaçe û tiving in. Ma ku ev gelê me ê qehreman xwe
bide ser hev, bibêje ‘erê’ û bide dû Reyis, gelo wê kes karibe
xwe li ber bigire!”
Sîpeyekî ku bi ser bêceme de çakêt li xwe kiribû û aliyekî
simbêlê wî zirav û yek jî qalind bû, bi hêrs ji nav
28
şekalan pekiya dera han; ”bijî Reyis, bijî Reyis!” got û bi
bazdan ji odeyê derket.
Şehabo bû ev. Zinêr tiştek li xwe çênekir. Ne guh dayê

û ne jî bêhna xwe veda. Lê ji keft û lepta Zinêr a bi zirt
diyar dibû ku gotina wî, mejiyê wî ê zingirî bêhtir zingirandiye.
”Ji bilî herêma Nisêbînê hema hema, temamê xortên
tirkan û gelê kurd îro dane dû partiya me û mezinahiya me
qebûl kirine. Lê çi fêde, ev partîk û martîkên me ên ku bi
navê şoreşgeriyê rabûne ser xwe û di bin perdê de bi dewletê
re ava serê gelê me germ dikin, di pêşiya me de bûne
kelem û nahêlin ku em bi ordiya osmanî-kemalîst-faşîstmilîtarîst
û emperyalîst re rojekê berî rojekê şerê namûs û
şerefê li dar bixînin!...”
Xeberdana wî bi Kenêr ne xweş hat. Nerehetiya xwe,
bi lebitandina birhuyên xwe ên şîn ku mîna firça diranan
diyar dikirin, da der:
”Ezbenî wilo xuyaye ku hûn ê di wextekî nêzîk de dest
bi şerekî mezin bikin. Lê ez ê tiştekî din bibêjim” got û li
ser hev peyivî:
”Zanyarî û têgihiştina ku we girtiye li gora emrê we,
pir li pêş e. We xwe pir zû hînî gelek tiştan kiriye. Hînkirina
we û meşa zemên li hev nake. We zeman pir bi dû
xwe de hiştiye. We ji bîr kiriye ku çerxa civakê giran digere
û civak jî wê tu carî wek we zû hînî gelek tiştan bi hev
re nebe û wek we neke. Dinya li ser menfehetê ava bûye.
Bazirganiyê insan aniye dereceke wilo ku menfeheta birê
di birê de tune be, biratiya hev nema dikin. Şerê bi dewletê
re şerekî mezin e, ne karê henekan e. Dostên ku bikaribin
devê dewleta tirko biçirînin ji me re lazim in...”
29
Çekdaran mîna ku zimanê xwe daqurtandibûn, bêhis û

pis sekinîbûn û ziq li devê wî dinerîn.
Şoreş bi haweyekî kubar:
”Apê delal, helbet dostên me jî hene.”
Kenêr dengê xwe rakir:
”Kîjan dost?”
”Gelê tirk, ereb, faris û temamê karkerên dinyayê dostên me ne.”
Heso bi ken da ber Kenêr:
”Ma ev gelê tirk, ereb û farisên ku hûn dibêjin qey bi vê wehşeta ku dewletên wan di serê me kurdan de dikin, nizanin hi? Belê belê, baş pê dizanin. Yabo bi telaq ev dostaya ku hûn dibêjin neket serê min.”
Şoreş piştî ku got ”dewleta Çînê û Rûsyayê jî li pişta me ne”, dev li serê zimanê xwe kir û pişta stuyê xwe xurand.
Kenêr bi hêrs da ser:
”Çî we heye ku hûn bidin wan heta ku ew jî li pişta we bin?”
”Em wek hev li dinyayê temaşe dikin û difikirin. Dost û dijminên me û wan yek in. Xwîna me û wan di cokekê de diherike. Biratiya me û wan ji dil û can e.”
Kenêr xwe aciz kir:
”Na, dost û dijminên me û urûsan ne yek in û xwîna me û wan bi cokekê de naherike. Urûs dijminên me ne. Di salên ku Atatirk kurd dikuştin, wan jî alî wî dikir. Ordiyên urûsan li hêla Serhedê, hata bi Kevirê Qul hatibûn û kurd kuştibûn.”
”Apo, ma qey tu sosyalemperyalîstçî yî?”

Kenêr piştî ku bêhnikekê li çavên wî nerî û hişê xwe
30
berda ser aqilê wî, ”divê mirov hevdu zorga neke”, got û bi hêdîka pala xwe da dîwêr.
Çekdar di gotina wî de ne gihan. Heso fêhm kir ku çekdar kelgermî ne û bi aqilê xortaniya xwe tevdigerin. Pêşî keserek veda, dû re jî destê xwe ê çepê mîna parsekên ber devê deriyê mizgeftên bajêr vekir, li koma xortên ku li ser pêyan sekinîbûn temaşe kir û bi dilsarî got:
”Lo bavo lo! Bi rastî jî em kurmanc miletekî dilkeçikî ne. Her yekî ku ji me re dibêje ‘merheba’, em jî hema jê re derpiyê xwe ji xwe dikin. Di cihê cih de divê mirov ji her kesî hez neke û dilê xwe jê re veneke. Urûs teriya kûçik e, nikare rast bibe. Urûs ne ê ku mirov bibe hevalê wî. Û a din jî, hevalbahcînî ne baş e xortino; mirov hevalê xwe aciz nake. Her tim her tişt wek mirov nabe. ”
Şoreş soro moro bû. Bi destê xwe ê çepê hişk bi qurmê simbêlê xwe ê rastê girt û bi wahc kişand. Ferşên diranên wî ên reş, di bin lêva wî a kişiyayî de wek ferşikên epiraxan xuya kirin. Heta bi kezebê hilma xwe kişand, di firnikên bêvilê re berda, serê xwe wek ê dîk rakir, li Heso nerî û dîsa berda ber xwe. Piştî bêhnekê bi haweyê ku hîç bêhnteng ne bûye, beşişî û bi fen peyivî:
”Apê delal, pêşî divê mirov bi xwe hebe û bi qeweta zend û bendên xwe karibe li ser pêyên xwe bisekine. Ma gava ku em nebin yek, ji xwe tu dewlet wê alîkariyê bi me re nekin. Helbet di her dostaniyê de menfehetek heye. Di dema Çar de rûsan dijminayî ne bi tenê bi me kurdan, bi

temamê gelê dinyayê re kirine. Ma ordiyên Çar êrîşî kîjan welatî ne kirine gelo? Erdek nemaye ku qetilam lê ranekirine. Lêbelê piştî ku Lenînê mezin şoreşa karker û gundiyan pêk anî, her tişt ji nuh ve saz bû û karwanê insaniyetê

31

di bin rêbaziya heval Stalîn de rabû ser xwe û berê xwe da temamê xwînmij û xwînrijên dinyayê...”

Şoreş hêdî bi hêdî bi ser xwe ve hat û keysa xwe li devjengê xweş kir. Lê bêhnek ne ket wê navê, leganên goşt û birincê kişiyan odeyê û kesî êdî nema rê bir ser tiştekî.

2

Circîs qesra xwe kils kiribû. Qesra wî a du tebaqe bi êvarkî re ji ser girê Doda diket nav çavê rez, çiyayên Omeriya bi ser de xûz dibûn; hewrên belek belekî diherikîn ser, di xeleka çiyê de gêr dibûn û qesr bi xwe re radikirin ezmên; dar û şînahiyên rez wek kefza di behrê de, kavil û xirbekên gund dinixumand û xwe li qesrê radipêça. Qesr ji aliyê roava de, wek guharekî bi guhê çiyê ve di nîvê newalê de dadiliqiya û bi sura bayê dar û deviyan re dihejhijî. Circîs tena bêceme û fanêrekê xwe ê sertazî û sipî di sênga civatê de li ser doşekê rûniştibû û satileke dew û du nanên tenûrê li ber bûn. Satil bafûnî û piçûk bû. Bi qasî elbikên dimsê Intabê mezin dihat. Ji peşkên dewê ku xwe li derdora wê niçik niçikî girtibûn û qilêra ku di qulpikan re dabû der, xuya dikir ku satil bi lûfik ne hatibû şûştin. Çembilê wê mihyayî û hinekî jî tewyayî bû. Çemçika ku di hindurê satilê de çit sekinîbû, destik dirêjî bû. Circîs ji qelebalixa dora xwe hîn jî loqê nîvişkê ku di nav dew de

dilîst, ne dîtibû. Nîvişkê wî mîna ku ê çêlekê bû, zer bû. Ji lîstika loq dide der ku loq, bi qasî libek tiriyê werdan mezin dihat. Perîxanê lingekî Circîs danîbû ser kaba xwe, bi destekî tiliyên lingê wî difirkand û destê xwe ê din jî jê
32
re kiribû baweşînk û bêwestan mêş ji ser ruyê wî û satila dew difirandin. Circîs rîha xwe hinekî berdabû. Qirşikekî zirav bi cênîka wî a rastê ve zeliqîbû; qirşik ji rîha wî a belek ewqasî xuya ne dikir. Lê herdu qilçixên sapê ku bi gevera porê wî ve daliqiyabûn, ji devê derî jî xuya dikirin. Simbêlên wî ên direj û hejikî heta bi çenê kişiyabûn. Bi tenê destên xwe şûştibûn. Toza pirêzê li ser birhuyên wî ên reş dibiriqand. Fanêre û bêcemeyê wî bi destan hatibûn dirûtin. Herdu jî lê fireh bûn. Di vê rewşa niha de, tam derbê şêxekî şingalî pê diket.
Kêfa wî li cih bû; şûr simbêlên wî ne dibirî.
Qesra Circîs mîna ku ji der ve de çarçikî xuya dikir, ji hindur ve jî wilo bû. Kevirên wê ên nicirandî xweş li hev dixwarin. Qorzî bi fesal bûn. Mezinahiya hinera qesirbendê omerî, di terkên aqda şibakan de bi her haweyî xuya dikir. Terk veşirtîbûn. Hindurê qesrê bi herdu qubale û refên li himberî hev û kulîna ku di dîwarê rohilat de hatibû çêkirin, fireh diket çavên mirov. Lê ne wek ku xuya dikir ewqasî fireh bû. Di zik hev de, ew jî rûniştî, pêncîşêst kesek tê de hildihat. Ji hindur û ji der ve de qesr sipehî bû. Lê bi dezgehekî bêmirês jî hatibû raxistin. Qerqotka sindoqa Perîxanê a ku hîn ji bûkaniya wê de mabû, hema li hindama derî avêtîbû. Ji pîrekan bêhtir zarok lê

diterpilîn. Zilam bi solên xwe derbasî hindur dibûn.
Neqşên di kulavan de, bi carekê ve kelpitîbûn. Kulavên ku
çend meh berê ji Mêrdînê kirîbûn, bi erdê ve bûbûn paçik.
Li hindur gelek mêş hebûn. Û pêşî jî. Xwe bi dîwaran ve
datanîn; dîwarên kilskirî ji pîsiya wan pitpitkî bûbûn. Ristikên
hermela darvekirî çarhawêr daliqandîbûn. Çend
sûret jî hebûn. Kulîn bê perde bû. Û livîn jî hema wilo
33
gelşikî hemû rapêşî ser hev kiribûn. Perdeyek li ber qubala
roava hebû. Belkî ew jî ji bo stara demaçeya Circîs bû.
Baqek gwîriz, qevdikek simbilan û pûnga ku kî dizane bê
ji kîjan salê de, li dera han bi bin zikê qesrê ve daliqandîbûn.
Paceyek ne derizî yan ne şikestî di vî hindurî de
tune bû.
Perîxanê piştî ku çîmê Circîs bi çîmê wî ê din ve
guhezt û dîsa dest bi firkadinê kir, berê xwe da Serdêr:
”Ka xwe berde xwarê û binere bê bavê te ji odeya
Hesoyê me ne hatiye mala xwe gelo. Heger hatibe bila wê
mîha ku bi simbilan ketiye bigurîne.”
Serdêr destê xwe wek ê zarokan hejand û bi zarokî jî
got:
”Bavê min kengî ji civata pêxwas û mêxwasan vedigere
malê. Zilamên Reyis hostê derewan in. Di nîvê çilê çil
de ji mirov re dikarin biharê bînin kabokê. Xweş dizanin
bi aqilê ên wek zoraviyan bilîzin.”
Circîs piştî ku awirek tûj tê firand, li Perîxanê nerî:
”Ma qey dîsa telebe hatine gund?”
Serdar berî dapîra xwe got:

”Erê kalo, lê ev telebe ne ji wan telebeyên ku tu wan nas dikî; gur in û postê mîhê li xwe kirine. Fêhl û finasên vê dinyayê hemû li ba wan in!”
”Ka bise bise, bide û bistîne, hêdî bi hêdî. Ev Reyis kî ye te got?”
”Ez çi zanim, yekî ji Rihayê ye û kes nizane bê bezê bin guhê bavê wî ji ku ye.”
Circîs keniya:
”Lawê bavê min, tu ji bîr dikî ku mezinê te jî diyarbekirî ye. Gava ku ê we ji Diyarbekirê be, bila wî çaxî jî ê
34
wan ji Rihayê be, ma çi xem e qey. Erê tu çima ji min re nabêjî bê ev navê wî Reyisî çî ye?”
Serdar zorî da xwe û kenê xwe di kûraya dilê xwe de girt. Lê dîsa jî kenê wî di herdu çavên wî re dida der. Piştî ku destê xwe danî ser devê xwe û bi dizî got:
”Kalo navê wî jî Circîs e”, rabû ser xwe. Ji bo ku tiştekî li xwe çêneke û bapîrê wî çewt fêhm neke, ber bi pacê de meşiya.
Circîs bi kêf got:
”Ê ma ji vî navî xweştir! Heger bi rastî navê mezinê wan Circîs be, bi telaq naxwe em kurmanc ketin dana Xwedê! Ew li ku bin, divê ez jî herim civata wan.”
Mîrzoyê Mitirb bi dengekî bilind keniya. Devê xwe dagirt, lê Serdêr gotin ji ber girt:
”Kalo paşnavê wî jî Bîtîren e, Bîtîren!”
”Yanî çi?”, Circîs got û ziq lê nerî.
”Yanî dibêje ku ez ê we kurdan bi carekê ve xelas

bikim!”
”Ê baş e, ê ma ji vê çêtir! Ma ne hûn jî dixwazin ku em kurmanc rojekê berî rojekê ji destê romiyan xelas bibin, lo.”
”Kalo, min xweşik tu li ber ne xist. Bîtîren bi kurdî ‘qedandin e’. Yanî mêrik wê miletê kurd bi carekê ve biqedîne, îcar te fêhm kir?”
Mîrzo hîn bêhtir keniya:
”Apê Circîs, bi telaq ebûkatê me rast dibêje. Zilamên ku navê wan Circîs be, ecêb in! Ma ne ji xwe, bê kê bîra ku mirov ji kîsên genim fanêre, bêceme û derpiyan çêke dibir, lo!”
Di salên ku dewletê, ji bo çandiniyê bi kîsan genimê
35
maksîkayê li herêmê difirot xwedî erdan, Circîs jî ji wan kîsan ji xwe re derpî, bêceme û fanêrekên sertazî çêdikirin. Du sindoq dagirtibûn. Pêrîxanê bêceme û derpî jê re didirût, lê fanêre wî bi xwe difesiland. Piştî ku binê kîs ji qinabê vedirşant, çep û rast du qul di kîs de vedikirin û xwe tê re derbas dikir. Gava ku radibû ser xwe, kîs li binya kabokan disekinî jê re dibû kiras û gava ku rûdinişt jî lê dibû fanêre. Wî bi vê yeka han pir kêfa xwe dianî û digot ”min bi kevirekî du çûk kuştine, ma kî wek min jîr heye!”
Circîs bi sixlet û diruvê xwe ji Heso bêhtir bi ser êzîdiyan ve çû bû. Mîrzoyê Mitirb ji tirsa wî stirana Seyrê û Eliyê Mamed ji kodika ribaba xwe avêtibû. Heta navê neviyekî xwe jî kiribû Şêx Hadî. Lêbelê Şêx Hadiyê wî xortekî fesad û zikreş û ewqasî jî tirsonek bû. Ne tu dûnde bû.

Bi gotinên Mîrzo re, tev li Circîs pirqînî li temamê civatê ket û tev de qasekî keniyan. Mîrzo piştî dît ku gotina wî ji her kesî bêhtir li hesabê Circîs hatiye, gotin domand:

”Ê erê, kuro ma ne ji xwe, Circîsê me ê menderî jî gundî xistibûn qelaqê, hûn hemû pê dizanin, lo. Baş bû ku lawên wî zû pê ve gihan, zilam derketin û mezinahiya malbatê ji dest girtin. Tew, ma qey ji xwe kes dikare behsa Circîsê tinatî bike! Tinata ku li dor pênc sed malî mezin dihat, hemû ji ber wî bi nav tirkan de terqiyan!”

Hesûk ji dera han, ”Mîrzo, îcar tu çima di ser bavê min re diqulipe”, got û li bavê xwe nerî.

”Hesûk, tu nikarî bi wî serê xwe ê wek gundorê dû xefkê, min û apê Circîs bîne himberî hev. Hema ez ê ji te re bibêjim hi, yekî ji wan circîsan jî nikarîbû li toza apê me Circîs bixista!”

36

Circîs hîn bêhtir keniya. Dev ji nan û dewê xwe berda û pala xwe da balîfê. Circîs bi qasî Heso neba jî, pir jê hez dikir. Di sala ku dengbêjê wî li ser qaçaxê hatibû girtin, dinyayeke pere lê xerc kiribû heta ku ew berdabû. Mîrzo di sala 1971ê de vê carê jî tajî hînî qaçaxê kiribûn û bi wan qaçaxî dikir. Di eslê xwe de a wî ne qaçaxî bû, ji Serxetê xwarin dişand Binxetê û ji wir jî vexwarin dianî gund. Mehê çend carekî li newqa her tajiyekî xwe kîsikek liqûm dişidand û bi mêja eşayê re tajî rêyî gundê Doda dikirin. Li wir jî pismamê wî, xelefa liqûman çend kîlo çayê bi tajiyan re lê vedigerand. Bi vî haweyî çarpênc

mehan qaçaxî kiribû û li gundiyan çayê kiribû ava
çeman. Lê çima rojekê yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê bi vê
konebaziya Mîrzo nahise. Bi komeke eskerên xwe ve
dikeve kemîna tajiyan û li ser têlên mayinan li wan girêdide.
Bi teqîna pêşî re tajiyekî wî di cih de tê kuştin û ê din
jî birîndar xwe ji nav lepên wan xelas dike. Dû re jî hema
pê re, yuzbaşî derdikeve taqîbata Mîrzo û bi pêncî-şêst
eskerî ve diavêje ser gund. Lê tajî ji terempêlên wî xurtir
derdikeve, bêhnçikyayî xwe digihîne Mîrzo û bi hev re
berê xwe didin çiyê.
Bûblanî di gundên xwe de û omerî jî di çiyayên xwe de
li Mîrzo xwedî derketibûn û serî ji êşkenca yuzbaşî re
dananîbûn. Lê liberxwedana wan mehekê dom ne kiribû.
Yuzbaşî jina Mîrzo rakiribû tabûrê û ji bêçareyî Mîrzo jî
xwe teslîm kiribû. Yuzbaşî piştî ku tiliya dirêj a destê
Mîrzo ê çepê jê kiribû û ji Circîs û Heso jî tam pêncî hezar
wereqe stendibûn, Mîrzo berdabû. Mîrzo di civatê de
digot û digot, ”heger ne ji apê Heso û Circîs baya, bi telaq
wê yuzbaşî heta bi dest û lingên min jî jê kiribana û gun-
37
dorkî ez bi ser jinêkê de şandibama!”
Bi dengê qelebalixa ku ji hewşê hat, Circîs kenê xwe
sekinand. Çend feqeyên torî ji xwe re genim didan hev. Ji
nav civatê kesek bi wan ve ne çû, lê hema piştî bêhnekê
dengê wan jî nema hat.
Etman bi qerf got:
”Necîmo, ma qongera we çawa derbas bû, lo? We û
wan telebeyên bi keleşkof we çi xist serê hev? Ma em û

eskerên romê em ê kengî li hev biteqînin, hi?”
Porê Necîm heta bi jora cênîkan weşiyabû. Kortika
serê wî hinekî bi hindur de kupyayî bû. Li gora hevtê û du
saliya xwe pir kal xuyanî dikir. Bejina wî a dirêj lê bûbû
bar û ew li hev gerandibû. Gava serê xwe radikir, çermê di
navbera çenê û qirikê de dibû tax, dikişiya û rehên wî ên
qalind mîna qarotên beqdûnisê şîn diyar dikirin.
”Wileh Etmano ez nizanim bê ez ê çi bibêjim, agir ji
devê wan diçû agir! Kuro bi saloxdanan dinya hemû bûye
hevalê telebeyan, em di guhê gê de mane. Hindik maye ku
em kurmanc jî bibin dewlet, dewlet!” Piştî ku destê xwe
baş hejand, vê carê jî berê xwe da Serdêr:
”Lawo Serdaro, ma ne tu jî ebûkat î kuro, hey lawê
nizam çi, te çima ev xeberên wilo xweş ji me re ne digotin?”
Etman çav da Mîrzo û bi haweyê henekpêkirinê peyivî:
”Her çi ebûkatê me û hevalên xwe, ên roja qewamê ne.
Mêrên çê sergiran û devgirtî ne û temamê hinera xwe li
bendî roja qewimandinê dihêlin.”
Serdêr gotina wî bi xwe ne xweş anî:
”Yanî çi apo! Ma ev aqil e ku di vê nîvrojê de mirov bi
38
keleşkof li gundan bigere. Hema ez ji te re dibêjim, qereqola
Stilîlê di bin guhê me de ye û eskerên wê her roj li ser
rêyan e. Ji xeynî vê jî, eskerên hidûd bi cemseyên xwe rojê
du-sê carî di Zorava û temamê van gundên me re derbas
dibin. Baş e, ku ew û zilamên Reyis li hev rast bên û li hev
biteqînîn û eskerek-dudu bên kuştin, dewlet wê çi bi serê
we de bîne, tu pê dizanî hi?”

Remo xwe kir darikê hewdelê:
”Apo tu nikarî pê, tu ji bîra dikî ku mêrik ebûkat e;
wilehî wê tiştinan bibêje ku tu rêya ber lingên xwe nebînî.
Yabo tu jî tiliya xwe di her qulê radikî, wilo nabe; her gep
nayê daqurtandin...”
Circîs ji nişkê ve destê xwe bilind kir:
”Ebukatê me ê jinan zana ye, ha! Na lo.”
Zoraviyan jî wek omerî û toriyan pir li jinên xwe dixistin.
Serdêr ew yeka han bi xwe ne xweş anîbû û qencxerab,
heq-neheq hevaltiya pîrekan dikir. Ji tirsa wî gundiyekî
newêrîbû li jina xwe xista. Circîs jî navê wî kiribû
”Ebûkatê Jinan.”
Apê wî peyivî:
”Serdaro tirtirekî ebûkata ye. Ma hûn nabînîn ku
mûyên sipî çawa avêtine serê wî. Qaşo ew jî bûye rêberekî
me kurmancan û wê me ji nav lêpên zilma romiyan
xelas bike, hi! Lawê bavê xwe sîr û pîvazê dixwe û bi jinika
tirk, bajarî û xwenda re radizê(!)”
Serdar endamekî komîta merkezî bû. Xortekî ne kin û
ne dirêj, navînce bû. Çepil û zendên wî li gora qilafetê wî
hinekî dirêj û destên wî jî baş mezin bûn. Rûgirover û
bêvilpehnî bû. Ji aliyê bejin û balê de bi ser bapîrê xwe de
çûbû, lê xwînşêrînî bû. Porê xwe wek ên şivanên herêmê
39
bi jor de şeh dikir. Digel ku zanîngeha hiqûqê ne qedandibû,
dîsa jî di nav gundiyan û heval û hogirên xwe de wek
ebûkatekî tirtire dihat qebûlkirin. Lê li gora Circîs ew
ehmeqekî Xwedê bû. Kitêba Lenîn a ”Du taktîk” wek

qelemê her gav bi xwe re digerand.
Di sala ku Partiya Komunîstên Tirkiyê, endamên xwe
ên jin bi mebesta ku xortên kurdan bi wan re bizewicin û
di Kurdistanê de cih bigirin, bi her aliyê welêt de şandibûn,
Serdar jî li Nisêbînê bi yekê ji wan re zewicîbû. Jinikê
li lîseyê mamosteyî dikir. Ne jineke xweşik bû. Bi ser
de jî qamqutî bû. Lê zanayê gotinê, zarxweş û devnermî
bû. Sekseke bajarî têkilî nav romantîzma marksîzmê dikir
û bi seetan dipeyivî. Tu carî mirov ji gotinên wê aciz ne
dibû. Devjeng û rexne di mista wensê de dibir û dianî û
mesele safî dikir. Di demeke kurt de, gelek xortên
nisêbîniyan di destê wê de bûbûn wek hevîr. Çawa dixwest
wilo şikil dida wan. Ahû û Serdar piştî ku li Nisêbîne
bi haweyê tirkî zewicîbûn, hema bi du mehekî jî hev du
berdabûn. Dû re jî ji tirsa ku Serdar derbekê lê nexîne, revî
revî xwe gihandibû Enqerê û nema hatibû Nisêbînê. Di
asasê xwe de heger jinik ewqasî ne dilbijokê ramûsanan û
kewişiyê têkiliyên cinsî bûya, bi rêya mêrê xwe dikarîbû
gelek xort bikirana endamên partiya xwe. Lêbelê gava ku
lê dibû şev, ji her du çavan hitim dibû; marksîzm bi carekê
ve li ber dibû seks, eşq û sefa û hestên wê ên pîrekî
digihan bandevê. Binçengên xwe ên hilmgenî di parfûmê
de şil dikirin, bi memikên xwe dev û ruyê Serdêr dinixumand
û radiza. Serdar jî ji ber parfûma wê her tim bapêşî
bû. Li gora ku Serdêr digot, Ahû bixwedakirina parfûmê
wek jê hezkirinekê dîtibû û xwestibû ku mêrê wê jî ji wê
40
yeka han re rêz bigirta. Lê mêrik fêhm ne kiribû ku jinik

bi qisûr bû û jinikê ew qisûra xwe bi qisûreke din vedişart.
Di vî warî de Serdêr serê xwe pir êşandibû û bi balkêşî
dîsa kitêba Lenîn a ”Du taktîk” xwendibû. Bi fen û taktîk
rabûbû, lê dîsa jî bi serneketibû. Çend şevekî sîr û pîvaz
xwaribû û bi jinikê re ketibû nav livînan. Jinik jî ew haweyê
wî wek heqareteke mezin dîtibû û di dawiyê de hevdu
berdabûn.
”Kalo, keça tirk nikare bibe jina lawê kurd. Min sed
carî ji te re gotiye ku min bi zanatî ew zewac kiribû. Min
bi wê zewacê xwest ku ez careke din ji gelek hevalên xwe
ên ebûkat, textor û mihendiz re bipeyitînim ku kurd û tirk
wê tu carî nikaribin bi jin û mêritî bi hev re bijîn. Îcar hewcenake
ku tu wê yeka hanê wek kêmaniyeke min e mezin
bînî ber bêvila min. Ma ez ew ê ku bi keçeke tirk re bizewiciyama,
ma tu min ewqasî kêm dibînî! Min lênerîneke
hin hevalên xwe ceriband û min ew hemû li derewê qelibandin
û weselam.”
Circîs bi bênfirehî û hêdî bi hêdî got:
”Lawê bavê min rast e, te xwendiye lê tu û hevalên
xwe hûn hemû bêaqil in. Mirov dikare bibe jina tirkan, lê
ew nikarin bibin jina mirov. Deka hema xweha xwe bide
yekî tirk û te jê tune be; bi telaq wê mêrik her roj lêxe, deh
zarokan jî jê çêke û xweha te jî wê hîç dengê xwe neke.”
Mîrzoyê kenok hîn bêhtir keniya. Şikeftika devê wî
xuya dikir.
”Wey apê Circîs bi Xwedê tu rast dibêjî, ev bîst-sîh sal
e ku çawîşê Stilîlê bi qîza Mala Baho re zewicî ye û rojekê
jî jinik ji ba mêrê xwe nexeyidî ye. Mêrik hindur tije

law kirine, kuro. Ê hema bi telaqê jinberdanê ku ew
41
xanim-efendî jina yekî ji me baya, wê ser me tije keçik
kiribana!”
Hesûk:
”Kuro qey ê wî hingiv pê ve ye, hingiv.”
Necîm:
”Na kuro tu xelet tefsîr dikî, hingiv di jinikê bi xwe de
ye.”
Perîxanê bi haweyê ku êdî divê ew jî tiştekî bibêje
keniya:
”Na na na, hûn hemû jî çewt dibêjin; tov beran e. Ji
nêriyan bizin çêdibin.”
Osmên:
”Eeehew Perîxanê, ew çi gotin bû! Ê hema bi telaq te
devê me hemiyan çirand, lê!”
Vê carê jî hinekî ruyê xwe tirş kir û got:
”Ma qey ne xebera min e, we gişan a xwe li lêwik kiriye
yek û hûn êrîşî ser dikin.”
Ruyê Serdêr bi gotinên dapîra wî re wek gulekê vebû.
Wî devjengeke bi vî haweyî ne dixwest. Di hindurê qesrê
de birek zilam rûniştîbûn û hemiyan jî bi seetan li çekdaran
guhdarî kiribûn. Li gora wî, civat bi carekê ve xeşîm û
cahil û çekdar jî jîr û zana bûn. Mirovê zana bi çend gotinên
girover dikarîbû mirovê cahil bixapanda û ew di zinaran
de werkiriba. Çekdar piralî bi wan re peyivîbûn û tesîr
li ser wan kiribûn. Û bi ser de jî çekdar zilamên Reyis û
Reyis jî ajanê MÎTê didît. Bi xwe hisiyabû ku divabû hîn

ji serî de rê nedaba wê yekê, ew bi xwe beşdarî devjengê bûbûya û nehişta ku mejiyê alîgirên partiya wî bi depûzê Reyis çelq bûbûya. Kerî ji guran re berdabû û dû re jî bi xwe zor dianî. Hiş û aqilê wî hinekî bi ser ê xalê wî Temo
42
de çûbû. Piştî ku diterpilî bi xwe dihisiya û koncal didît. Partiyê bawerî pê anîbû û bi mebesta ku herêmê ji zilamên Reyis biparêze, herêm bi temamî teslîmî wî kiribû.
Piştî ku Serdêr sivik sivik got:
”Ew telebe ne ji me ne, gur in û postê mîhê li xwe kirine. Muxbirçiyên dewleta Tirkiyê ne. Mezinê wan li Enqerê rûniştiye û bi MÎTê re kar dike”, rawestiya û guhê xwe da ser civatê.
Osmên:
”Lawo tu çima wilo dibêjî? Ew xort ji min û te çêtir bi kurmancî dizanin. Û tiştên maqûl jî gotin. Yabo bi telaq diruvê muxbiriyê hîç bi wan nakeve.”
”Ma ne çefiyên pêşmergeyan jî li serê wan pêçayîbûn”, Cimo got û bi lez hilmek li çixareya xwe xist.
Serdêr jî di vê navê re pizika ku di serê bêvila wî de hatibû, diperçiqand û nêm jê der dikir. Bêvilê bi qasî pelikekî erbanê kew vedabû.
Celîl ji dera han:
”Telebe baş in, lê bi tenê min exlaqekî wan ne heciband. Ax ne ji wî exlaqê wan ê zarokî baya! Tiştekî zêde zêde ji hev didexisînin û dev diavêjin hev. Li tifaqiyê digerin û ew bi xwe bi hev re ne bi tifaq in. Her partiyek wan serê werîs ber bi xwe de dikişîne û dimeşe. Wilo nabe,

divê hûn pêşî li hev bikin Serdar. Ma ku hûn li hev nekin, em ê çawa bidin dû we û li himberî vê dewleta kafirbav rabin, hi!”

Serdêr bi destê xwe ê rastê serê bêvila xwe girt û bêvil kişand. Piştî ku tiliyên wî di xwînê de şil bûn û tilî bi devdelingê pantorê xwe ê qedîfe paqij kir, destê xwe hejand û tena tena peyivî:

43

”Apo, helbet heqê we ye ku hûn doza tifaqê li temamê partiyên me kurdan bikin. Bêşik, tiştê ku hatiye serê miletê me hemû jî ji destê bêtifaqiyê ye. Sebebê ku heta roja îro Kurdistan azad ne bûye û em kurd ne bûne xwediyê tiştekî, bêtifaqî bi xwe ye. Di vî warî de xelkê me pir êş û cefa kişandiye. Miletên dinyayê ên bindest bi tifaqê, xwînxwarên xwe têk birine û bûne mezinên xwe. Lê divê mirov vê jî bizanibe, bi kê re tifaqî? Ma bi xayinan re dibe? Na. Bi bêbext û hevalkujan re? Helbet nabe...”

Cimo gotina wî birî:

”Ma qey wan telebeyan hin ji hevalên we kuştine?”

”Na. Lê wê bikujin. Ên ku bi xayintî bikaribe hevalê xwe bikuje, wê bi rehetî bikaribe min û te jî bikuje. Ew ên ku we bi seetan li wan guhdarî kiriye, heta niha tam nozdeh hevalên xwe kuştine. Berî ku dewlet wan derxîne holê, di nav temamê rêxistinên kurdan de devjeng û rexne hebû. Her kes dihat ba hev, pev dişêwirîn û alîkarî bi hev re dikirin. Bi derketina wan re kuştin ket Kurdistanê, devjeng, rexne û alîkarî ji nav me rabû...”

Circîs temamê hişê xwe dabû ser gotinên wî û li keft û

lepta wî dinerî.
”Baş e, ew xerab; hûn ev ên din çima bi hev dadikevin
û dev diavêjin hev? Di vî gundî de pazdeh-bîst telebe hene
û yek jî li ba yekî rûnane. Mîrzo, ma ne wilo ye tu bi qedirê
Xwedê kî?”
”Apê Circîs, ew ji me çêtir dizanin. Wan xwendiye û
ew li dinyayê geriyane. Kar û barê îro bi mirovên xwenda
û geryayî dimeşe. Dema te û apê Heso çû, we dewra xwe
bi berberiyê qedand. Çi xerabiya ku ji destê we hat we di
serê vî gundî de kir. Hema telebeyên me çendî dijminên
44
hev bin jî, wê tu carî bi qasî we nikaribin vî gundê şênî
xerab bikin û hew.”
Zarokê ku di qorziya qesrê de serê xwe xistibû kulîna
livînan û bêdeng digiriya, bala Mîrzo kişandibû. Gotina
xwe kin birî û ber bi lêwik de çû:
”Bavkê mino, tu çima digirî? De ka ji min re bibêje bê
kê li te xistiye?”
Ew hîn wilo dipeyivî, Ridwan bi lez derbasî hindur bû
û wek dînan li derûdor nerî. Li lawê xwe digeriya. Civat
bi hatina wî hayî ne bû, hemû digel hev bi Serdêr re dipeyivîn.
Lê bêhnek ne ket wê navê, her kes bi qelebalixa
Mîrzo û Ridwên sekinî û bi Ridwên re xeyidîn.
”Erê kuro, bê çi ji xwe fedî nake! Lawik di nav lepê
min de ye û ew jî dixwaze li lêwik bide.”
”Çima qey lêwik singê golik rakiriye?” Circîs got û li
bendî bersiva xwe sekinî.
Mîrzo pir jê aciz bûbû; destê xwe dihejand û bi hêrs

dipeyivî:
”Gava ku Idrîs mîhê ser jê dike, lawik jî dibîne. Ji xire xira mîhê û xwîna ku ji qirika wê dibeliqe, ditirse. Ê wê bitirse, lawik hîn pênc sal ne kirine, weh! Tiro jî bi xwe ne xweş aniye ku çima lawê wî ji xwînê tirsiyaye. Mêrik xwe qeraseyekî mêran dibîne hi! Ev telebe divê pêşî ji me dest pê bikin...”
Ridwan li nêzîkî Circîs rûniştibû. Mîrzo destê xwe ber bi pê de vekir:
”Êh, ji xwe re li qerpalkên wî û simbêlkên wî binerin, wê bi wî ji min re Kurdistan û mirdistan xelas bibe, hi!”
Ridwên jî mîna ku tiştekî baş kiribû, wek her kesî wî jî tizbiya xwe dikişand û bi gotinên Mîrzo dikeniya.
45
Serdêr dîsa xwest ku bi fen û taktîkan here civatê. Piştî ku got, ”mirov dikare bi tiliyan zilamên Reyis bihejmêre; hemû li ser hev ya bîst kes hene yan tunene”, rabû ser xwe û ber bi satila avê de meşiya.
Baş bû ku civat hîn jî li ser bûyera berî niha dipeyivî, hişê kesî ne li ser bû. Lê dîsa jî gotinên wî ji guhên Circîsê ku di berberiyê de guh bi qasî ên roviyekî bel kiribûn, ne reviyan.
”Hûn jî wek me nikarin hev du tehamil bikin. Bi bêbextiyê mirov mezin nabe, lawê min. Berf dihile zibil xuya dike, gîha di bin tahtan de namîne.”
Serdêr fêhm ne kir ku kalikê wî jê re dibêje ”civatê piçûk nebîne û gotinan bi vir de û wir de neteriqîne; bizanibe bê tu çi dibêjî.”

”Kalo, dewletê her tişt bi zanatî kiriye.”
Mîna ku li Emerîkayê di mehkemeyê de be, ji cihê ku
lê av vexwaribû pê bi pê meşiya, serê xwe rakir û danî,
xwe li hev zîvirand, ji jor de li civatê nerî, bi teqil destê
xwe hejand û domand:
”Dewleta tirkan pir fenbaz e. Her gava dîtiye ku miletê
me tevgeriyaye û dest bi xebateke kurdistanî kiriye, ajanên
xwe xistine nav wan û doz têk biriye. Tirkan di raperîna
Şêx Seîd, Agirî û Dêrsimê de wilo kirin û bi serketin.
Ji sala 1960î û vir ve, dîtin ku xelkê me bi tevgera xwendekarên
xwe hêdî bi hêdî ji temara mirinê şiyar dibin û
xwe wek kurd hîs dikin, îcar çi kirin?”
Xeberdana wî li telê Haco ket, qevizî ser kabokan:
”Tu ne rast dibêjî, em ne bi telebeyan şiyar bûne û ne
jî me bi wan kurdîtiya xwe nas kiriye. Hema ji sala ku ez
heme û heta niha ez dizanim ku esker tirk in û ez jî kurd
46
im. Tu carî rehma mêrê tirk ne ketiye dilê min û ez wek
we bi tirkî jî ne peyivîme, hi!”
Circîs xwe avêt pişt:
”Min bi qasî giraniya te pere dane berzaniyan û heta
min sîleh jî ji wan re kiriye. Di sala ku Atatirk fermana
gergerekên kurmancan rakiribû, bavê min jî di nav wê fermanê
de bû. Apê min di qelaçên Sirêçkê de pazdeh-bîst
esker kuştibûn û em koçmal binxet bûbûn.”
Perîxanê piştî ku kitana xwe ediland û bi zimanê xwe
lêvên xwe şil kirin, çavên xwe hinekî firkandin û peyivî:
”Erê lawê min, di sala ku Circîs beg û Heso axa dîsa

şer derxistibûn û di wî şerî de Etman ji mirinê filitîbû, em pir desteng bûn û zilamên Berzanî jî li hûkê digeriyan. Du zêrên min ê reşadî hebûn, min ew herdu jî dan wan."
Mîrzo:
"Rast e, ma qey nayê bîra we, li ser wê hûkê çawîşê Stilîlê çend carekî apê Heso jî biribû qereqolê û lê xistibû. Serdar rûniştibû û ji ber dixana danûyên ku di sê niqiriyan de pîrekan li hewşê dikeland, di cihê xwe de habela diqeliqî. Car carê destê xwe dida ber devê xwe û dikuxuya. Çixare jî dikişand.
"Partiya me baş pê dizane ku ji Colemergê heta bi Dêrikê û Serê Kaniyê jî xelkê me welatperwer û tirkdijmin e. Ji ber vê yekê jî qîmetekî hêja dide wan. Nexasim di nav hevalan de gava behsa van çend gundên me tên kirin, her kes bi çavekî mezin li wan dinerin û hêviya qencî û mezinahiyê ji wan dikin."
Hesûk xwe nepixand, simbêl badan û giran giran peyivî:
"Biraziyê min rast dibêje, di wê dema ku ez bi xwe re
47
biribûm Serê Kaniyê, hevalên wî ez ji destên hev direvandim. Danê sibehê yekî, nîvro û êvarî yekî ez dibirim mala xwe û ez diezimandim. Ha, li wir jî digotin 'çend zilamkên Reyis ketine nav karkerên çiftlikê û ha ha teşqeleyan derdixînin.' Gelo nebe ku hikûmetê ew şandibin vir jî, ji bo ku em dîsa xwe bi xwe bi hev kevin, hi?"
Sebrî mîna ku ji xewê şiyar bibe, nehişî peyivî:
"Ma çima qey em mîh in ku em bidin dû her kesî û li ser tiştên pûç û vala dîsa bi hev re berberiyê bikin! Ew

xort helbet hinekan ji vî gundî nas dikin.”
Serdêr bi qahr got:
”Rast e, hevalên Reşo ne. Wî ew şandine gund. Reşo rehet nasekine, li kalikê xwe Heso çûye. Qîma me nayê ku vî gundî ji destê partiya me derxîne, em ê wilo jê qebûl nekin!”
Circîs xwe hinekî aciz kir. Perîxanê berî wî li xwe qewimand:
”Civat li te guhdarî dike, beroçeqî nepeyive!”
Mîrzo vê carê jî mîna şêxên serhanî peyivî:
”Telebe hemû jî baş in. Di hersên mehên havînê de bi feqîr û fuqran re diçin tevrika pembo, perekên xwe didin wan û ji wan re li ser kurdîtiyê dipeyivin. Dilê xwe bi belengaziya wan dişewitînin. Li cihekî wek Mêrdînê bi hezaran li hev dicivin, xwe di kaxet, qerton û paçik maçikên kes û sor zer de radipêçin û xeberan ji dewletê re didin. Bi telaq mêrên wek wan tune ne! Berberî ji nav me gundiyên beredayî rakirin, ma ji vê xweştir! Ax ku îcar wan xwe bi xwe bi hev re berberî ne kiribana!”
Osmên da ber Mîrzo:
”Tu rast dibêjî. Ma li ser vî qelenî kî û kî nemêr ne bû,
48
lo! Qelen rakirin qelen! Li ser dilketinê, îro ne mirov tên kuştin û ne jî malê kesî talan dibe.”
Circîs keniya:
”Bê çi pê nakeve, tir di qûnê de ne maye, ha. Erê çima tu nabêjî mane eyb e ku bi tirkî bi hev re dipeyivin û kaxetk maxetkên xwe bi şeldim beldimkî ji me re

divîsînin? Lê tu...”
Hesûk jî a xwe got:
”Ma ev telebe, mela ne ku henekên xwe bi araqvewxarina
ên wek Erol Efendî dikin û nahêlin ku araqê vexwin?
Li Nisêbînê gelek kesan li ser araqê mala xwe bar kirin.”
Piştî ku li Serdêr nerî û keniya, tam da nav:
”Li Serê Kaniyê hevalên Serdarê me, bi milama ku
çend hevalên wan ji çixareyên qûnpembo hez dikirin ji
partiya xwe avêtin. Ma niha ev a kirinêye hûn bi qedrê
Xwedê kin, lo! Ew ‘antî-şoreşger’ ilan kirin û qiyamet bi
wan de anîn! Çend kes jî li Nisêbînê li ser lixwekirina
bedilan û cilên sipehî ji nav xwe avêtin. Ê, belkî mêrikan
ji xwe fedî dikirin ku kevnekotk li xwe kiribana.” Vê carê
jî li Circîsê ku lê guhdarî dikir, nerî:
”Yabo, li ba wan paqijî eyb e ha (!) Porê xwe jî nikarin
dirêj bikin. Bi çavên tolazan li pordirêjan dinerin. Yabo,
ma te zanîbû ku ev telebe goştê pez û dewaran wek xwarina
axa û began jî dibînin? Simbêl, şekala meqabê û cilên
pînekirî nîşana şoreşgeriya wan e. Di civata wan de cihê
simbêlboqan pir bilinde, yabo. Mirovên wek te simbêlboq
bi qasî Marqs, Lenîn, Stalîn û Mao mezin dibînin!”
”Îcar ev Maqs û Mayo kî ne, Hesûk?” Circîs got û pê
re jî beşişî.
”Mezinên wan in.”
49
”Ma gelo li ba wan rîh jî qaçax e?”
”Na yabo. Ji hevalên xwe ên bi rîh re pir hirmetê digirin.”
”Ê ev mela ne naxwe, yabo qurbano. Ma Reşo jî wilo

ye gelo?”
Serdarê ku bi gotinên Hesûk tengijîbû, sivik sivik û li ser hev got:
”Reşo ji me jî pîstir e pîstir e!...”
Circîs tam aciz bû:
”Reşo ji te û temamê sûlala te jî çêtir û mêrxastir e. Bê çi ehmeq e kuro! Li ber destê min mezin bûye û hîn jî nizane du gotinên maqûl di civatê de bibêje, bênamûs lawê bênamûsan!...”
Serdar wek pilingekî ji cihê xwe çeng bû û bi lez xwe berda hewşê. Bêhnek ne ket wê navê, deng bi texsiya wî ket û texsî bi ser rêya Menderê de wek mêr sûrikî. Toza bi dû xwe de rakiribû heta ku Menderê derbas kir jî ji hev qût ne bû.
50
BEŞÊ SISÊYAN
1
Mîna ku ro bi derbên şûr û riman ketibû zerikê. Di mextela wê de mirov digot qey xwîn bi ser dinyayê de dinisilî, mextel tîştîşî û sor û mor bûbû. Ezman mîna sîmê bû. Bi tenê hew çend stêran xuyanî dikirin. Ji heyvê re hîn pir divabû ku derketa. Sirûşt tevdigeriya; bi lez xwe ji qêlik derdixist û bêhneke xweş difûrand. Deng bi çirçirkan ketibû. Bê ne didêrand, lê dîsa jî dinya hênik bû. Xortên serek malbatên gund defa sêngê û keçan jî qûntara memikên xwe difirkandin; xortan bi lewentoyê û keçan jî bi gulavê porê xwe şeh dikirin. Keçên xatûnan ku newqa xwe ji xezalan dizîbûn, keziyên xwe wek fitlên maran

dabûn ser hev û xwe di misk û emberê de hiştibûn. Zilfên
perî bi ser ruyê gewherî de bûbûn kevan. Serê memikên
wan di bin fîstanê şîrîkî de wek du lib hersim bel bûbûn.
Kember di bejin û bala bilind de bûbûn xelek. Mirov digot
qey sênga wan dikanên zêringeran bûn, ji xwe re û me re
diçirisandin. Qirika gewr û boz wek berfa şevnivistî ku
xunava baranê digirt ser, xwêh dabû û dilopên xwêhdana
borana eşqê hêdî bi hêdî di coka memikan re dihatin
xwarê. Memikên hinarî, bêvila çilagî û çavên wan ên
xumarî û şîn, di bin birhuyên heyva yekşevî de, mîna
komikên stêran xuyanî dikirin. Mijankên ku ji tîrên nijdevanan
jî dijwartir bûn, li kilê siphanî xistibûn û bêwestan
di cihê xwe de diqelqilîn. Lê şevê hîn jî xwe tazî ne kiribû
û stêran ne dilîstin. Ji ser Hewdê Birxulan dîsa kewekî
berê xwe dabû goristanê û mîna ku waz li miriyan dikir,
51
qebqeba wî bû. Dengên çûkên beytik ne dihat. Teyrekî
mirîşkan mîna ku dixwest li ser darên behîvan bilûsta û ji
xwe re li cihekî bi star rast ne dihat, ha ha xwe datanî û
difiriya. Garanê ji zû de xwe berdabû gund. Lê herdu keriyên
pez hîn jî di çêra xwe de bûn. Piştî çêra dawî li guherên
rêya Bamidê wê ketibana mexel û şevder bimana.
Gundiyan bi dorê şevîn dikirin. Bin berqefên bestê reşxeriqîbûn
û mîna tabiyên eskeran xof didan! Terempêla ku ji
Nisêbînê rêwî dikişandin Stilîlê a dawî jî derbas bûbû.
Kenêr bi haweyê ku ji hewarê dihat û wê biçûya dawetê,
bi lez kera xwe diajot. Ji nav bîstanê xwe ê ku bi danê
sibehê re qurifandibû, dihat. Xurcika xwe dîsa ji petêxên

destarkî dagirtibû. Kûçikan xwe berdabûn navtarên gund
û mîna ku şêwrek digerandin, dudu dudu-sisê sisê dabûn
ber hev û diçin û dihatin. Ji şewqa terempêlên li ser rêya
Îpekê xuya dikir ku reşayî ketibû dinyê, di pişt şewqê de
çavên mirov terempêl xweş ji hev ne difesilandin. Pisîka
Simo û a Fesîh li binya mizgeftê cardin bi hev ketibûn.
Dengê nire nira wan di ser gund re derdiket. Xortan dîsa
bi qewsikê du teyrik li ber birka avê kuştibûn, lê hîn jî xwe
ji bin herdu darên tuyan ne dabûn alî. Gulên berbero di
nav bîstanên nêzîkî xeta mayinan de, mîna eskeran xuya
dikirin.
Her kes derketibû ser xaniyan. Keç û jinan livîn rast
kiribûn. Çîtê ku jina Kerîm li textê xwe pêçabû, bi
sipîbûna xwe li temamê çîtên xwedî textan ferq dikir.
Mirovê ku nizanîba, wê bigota qey mêrê wê axayê gund e.
Li ser hin xaniyan erzêl hebûn û dora erzêlan yekser
çeperkirîbûn. Zarokan hêdî bi hêdî xwe berdidan ser bênderên
binya gund; haziriya xwe û ”çirê” dikirin. Lê çen-
52
dên ku li ser tingê jora gund bi lagan dilîstin, hîn jî dev ji
lîstika xwe bernedabûn. Hinan jî li gasînan çirtvîtk didan.
Mirov digot qey li vî gundî mêr tune bûn, ji her aliyê gund
dengê pîrekan dihat. Ji ser xaniyan û ji vê û wê navtarê bi
hev re dipeyivîn. Bergîla Heso dîsa ketibû nav bîstanê Circîs.
Circîs jî bi dilşewatî lê nerîbû û bi lawê xwe de xeyidîbû.
Lêw bergîl rapêşî xwe kiribû û ew ber bi mala Heso
de dianî. Hesûk rahiştibû keleşkofa xwe û ji ser qesrê
nîşan li dîrekê elektirîka ku ji Nisêbînê ber bi Mêrdînê de

diçû, digirt. Ne zilaman êdî ewqasî lê dinerîn û ne jî zarokan destên xwe didan ber guhên xwe. Her êvar wilo dikir û fîşek ne diteqand. Di vê gavê de jî Serdar û hevalên xwe bi neqebên odeya Heso ve hildikişiyan. Heso ji ber xortan rabû û rahişt destê wan:

”Hûn di ser herdu çavên min re hatin; kerem bikin li vir rûnin.”

Ji xort û zilaman rê û rêwanî li ser odeya wî ne mabû. Serdar û hevalên xwe li himberî Şoreş û hevalên wî di sênga civatê de rûniştin; xwe ji devjengê re amade kirin û di lûla tivingê re li wan nerîn. Ên din jî wilo li wan dinerîn. Di vî gundê şênî de ji temamê rêxistinên kurdan xwendekar hebûn. Û ji bilî Reşo hemû jî beşdarî vê civatê bûbûn.

Kelecaneke mezin girtibû gundiyan û heryekî bi ê kêleka xwe re dikire piste pist. Bêsebir di cihê xwe de diqeliqîn; mîna guran li devê xwendekaran temaşe dikirin bê ka wê ji hev re çi bigotana û ew ê jî ji xwe re hînî çi bûbana.

Aydinê ku mezinekî Partiya Sosyalîstên Memûrên Kurdistanê bû, piştî ku li Sînên nerî û di bin simbêlan re

53

beşişî, bi haweyekî hişk got:

”Komunîzm îdeolojiyeke proleterî ye û xwediyê vê îdeolojiyê jî karker û ronakbîr in. Çênabe ku partiyeke komunîst ji komik û momikên cihê cihê pêk bê. Lê mixabin partiya Reyis ji du-sê grûbkên ku kes nizane bê kê temsîl dikin, pêk hatiye” û dengê xwe birî.

Tev li Serdêr û hevalên wî, her kes di cihê xwe de cemidî û bala xwe da ser Şoreş. Zinêr xwe aciz kir û xwest ku wek wî bipeyive, lê Şoreş berî wî got:
”Rast e, Partiya Komunîstên Çînê jî ji çend grûbkên ku heryek ji wan lawê papaz, axa, komprador, feqîr û belengazan bû pêk hatibû. Lê ji ber ku wan hêzeke nuh temsîl dikirin û ew hêz jî proleterya bi xwe bû, bi serketin û bûn mezinê Çînê.”
Aydin bi benikê qerewata xwe girt û kişand. Dû re jî qerewat li stuyê xwe sist kir û ji karmendekî bêhtir wek aqilmendekî peyivî:
”Li Çînê tu carî partiyeke komunîst çênebû heta ku komunîst bi ser bikevin. Çan Kay-Şek û Vang Cîng-Vey ji Mao û partiya wî pêşverûtir bûn. Mao jîr û zanayên welatê xwe kuştine û bûye mezinê cahil û pêxwasan. Navê birakujiyê ne serketin, binketin e.”
Şoreş mîna ku henekê xwe pê bike, keniya:
”Mirovên axa û burjuwazî çawa dikarin pêşverû bibin! Çan Kay-Şek û Vang Cîng-Vey axa û burjuwaziyên Çînê temsîl dikirin û welatê xwe pêşkêşî emperyalîstan kiribûn...”
Sînanê ku mezinekî Partiya Reel Komunîstên Kurdistanê bû, ferq kir ku ew rê lê nebire, wê ji bo partiya wî jî baş nebe.
54
”Belê ezbenî, di salên ku Cen Du-Sîyu sekreterê Partiya Kominîstên Çînê bû, wî jî bawerî pê anîbû ku di pêşerojê de wê şoreşa wan şiklê cumhûriyeteke burjûwazî bistîne. Û ji ber wê yekê jî ji meqamê xwe bû.”

Xwest bibêje ”piştî ku Mao dibe desthilatdar, wî û hevalên wî hemiyan dikuje”, lê Restemê ku mezinekî Partiya Maoîstên Kurdistanê bû, ew sekinand. Destê xwe hejand û bi qahr got:
”Yanî çi! Cen Du-Sîyu bi nexweşiya oportunîzma rast ketibû; karker û gundî piçûk didîtin û parlamentarîzm diparast. Dixwest ku li Çînê kapîtalîzm tam bigiha û li parlamentoyê li heqê karker û gundiyan bigeriya. Partiya we jî ji bo miletê kurd wilo difikire...”
Aydin henekê xwe pê kir:
”Yanî Maoyê te ew jî kuşt, ne wilo?”
Serdêr:
”Buharîn jî wilo fikirîbû”, got û sekinî.
Piştî ku Şoreş got ”lê ew jî hat kuştin”, vê carê jî Bekirê hevalê Serdêr peyivî:
”Heq kiribû. Kamenev û Zînovyev jî heq kiribû.”
Bekir sîh salî bû. Bi qasî tayikekî dirêj û zirav bû. Bi porê wî ê reş, şahîk û dirêj mirov tê derdixist ku dixwest xwe bişibîne Ernesto Chguera. Gava dipeyivî jî serê xwe wek serê wî ê ku li ser tîşortan bû radikir, ji jor de dinerî, awir vedidan û dipeyivî. Lê simbêlên wî hinekî qalind bûn. Ji Diyarbekirê bû.
Berpirsyarê Partiya Herî Komunîstên Kurdistanê ê Enqerê Bişar, bi dû ku hilmek li çixareya xwe xist û bêyî ku dixana xwe hemî berde, bi simbêlên xwe lîst û got:
”Can Guo-Dao jî bi nexweşiya oportunîzma çep keti-
55
bû; wî jî gundî piçûk didîtin. Ketibû xeta Tiroçkîstê sosyal-

faşîst. Li Ernawîtê komunîstê mezin Enwer Xoce jî...”
Heso beşişî:
”Bavên mino hêdî hêdî, we hîn Çîn safî ne kiriye û hûn berê xwe didin Ernawîtê, wilo nabe!...”
Her kesî heq da Heso û bi gotina wî keniyan. Bişar jî li pêşiyên xwe çûbû. Xortekî zirav î dirêj bû. Hema hema temamê mêrên bûblaniyan dirêj û bi dar û ber bûn. Bi ser Gird Elî ve çûbûn. Gora Gird Eliyê ku li Zivinga Bitû li ber windakirinê bû, tibabekî dirêj bû. Mirov xof dikir lê temaşe bikira. Qisûra Bişar a herî mezin ruyê wî hinekî dişibiya ê mîhê; dengê wî jî. Lê kuxuka wî tam lê ê wê çûbû.
Berces zû pê ve danî, xwe aciz kir û berê xwe da Bişêr.
”Tu çawa dikarî ji komunîstekî wek Troçkî re ku her tiştê xwe di rêya jîr û zanahî û mirovperweriyê de feda kiribû, sosyal-faşîst bibêjî! Tu di derbarê Tiroçkî de çi dizanî? Te çend kitêbên wî xwendine? Kî ye û ji ku ye? ew Troçkiyê ku Stalînê we ji tirsa wî newêrîbû raketa. Gramsî bixwînin da hûn alimtiya Stalînê xwe fêhm bikin!...”
Serdar ji cihê xwe çeng bû û bi herdu destên wî girt:
”Berces, ez ricayê ji te dikim bisekine! Bi minaqeşeyê yek ji me ne himberî te ye. Lê divê tu jî me fêhm bikî, mesele cidî ye. Heger tu jî wek me xwedî partî ba, wî çaxî te çi bigota heqê te bû. Te hinekî serê min jî tev li hev kiriye. Hey me hemiyan daye dû Stalîn, îcar bihêle bê ka em ê di kîjan newalê re derkevin.”
Berces piştî ku got, ”hûn ê di newala Waweylê re derkevin”, pişta xwe da balîfê û li Kenêrê ku kêfa xwe bi

gotina wî re anîbû û dikeniya, nerî.
56
Bercesê nisêbînî li rohilatî Ewrupayê piştî ku sosyolojî xwendibû, çûbû Swêdê û li wir bi cih bûbû. Mirovekî esmer, kin î zeîf û devnerm bû. Zimanê kurdî baş bi kar dianî. Lê hin dengdêrên wî dengê swêdî girtibûn. Xwe tiroçkîstekî kurdan didît. Lê li gora telebeyan ew evulusyonîstekî swêdî bû. Dîsa li gora wan, qisûra wî a herî mezin ku marksîzm bi kultura sosyaldemokratên skandînawî rave dikir û ji şerê çekdarî direviya. Û ji ber wê yekê jî kesî pê re hevaltî ne dikir. Bi mêhvanî car carê dihat welêt û têkiliyên xwe bi telebeyan re xweş dikir. Berces mirovekî ji xwe razî bû, lê ji yekî ji xwe razî jî ne dihenitand. Bi vî haweyê xwe kubar û şêrîn dibû. Dixwest têkeve çavên civatê; lê hew tenê bi zimanê xwe. Ev yeka ha jî ew di qada telebeyên zana de tahl dikir. Reşo car carê jê re digot, ”ax ku ne ji vî aliyê te ê megolomanî ba, ê ne bê tu ê çiqasî şêrîn ba. Gava tu êrîşî Stalîn dike, bêyî ku tu bi xwe bihisî tu dibî heyranê Troçkî, ezbenî. Dîsa jî baş e ku megolomanîzma te hema pasîv e.”
Rojekê yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê bi mebesta ku qaçaxçiyan dîsa li hidût xistibû, tê gundê Dala; gundiyan derdixîne ser bênderan û li wan êşkenceyê dike. Bercesê ku bi mêhvanî hatibû gund, bi haweyê ku Dala gundekî Swêdê ye û li himber yuzbaşiyekî swêdî rawestiyaye, bi zimanekî kubar li ser heq û hiqûqê insên bi ê yuzbaşî re dipeyive. Yuzbaşî jî hema di cih de dev û diranên wî dipelixîne, wî radike tabûrê û piştî bîst û neh rojan wî berdide.

Li gora ku dihat gotin, Berces ji destê êşkenca ku xwaribû du mehekî li nexweşxana Diyarbekirê raketibû.
Circîs jî bi haweyê ku bala civatê bi aliyê xwe de bikişîne:
57
”Ev hûn çima behsa Berzanî nakin, lo? Berzanî di bin guhê me de ye û hûn diçin heta bi Çînê”, got û qut kir.
Kesî guh nedayê. Telebe bi carekê ve li dijî Berzanî bûn û ew zilamê emperyalîstan didîtin. Lê ji ber ku gundiyan jî qîmeteke mezin didan Berzanî, newêrîbûn têketana vê mijarê.
Sînan mîna ku Circîs tiştek ne gotibû, tena tena û cidî peyivî:
”Tarîxa, qaşo, komunîstên çîniyan(!)tarî ye. Wan tim û dayim demokrasiyeke eskerî bi kar aniye. Ew li ser cendekên welatperwer û demokratan bilind bûne. Hevalên xwe bi xayintî kuştine û dû re jî ew ajanên emperyalîzmê ilan kirine.
Di salên ku partiya Mao bi Guomîndang re li himberî milîtarîzma japonî cephe danîbû, îdeologê partiya wî Vang Mîng jî bi çavekî mezin li vî cebheyî dinere û ji bêbextiyê direve. Bêbextî dibêjim, çimkî piştî ku Mao îşê xwe bi cebheyê diqedîne, ên ne wek xwe hemiyan ser jê dike. Mao vê lepta Vang di qalibê oportunîzmê de digire û wî jî ajanekî emperyalîstan ilan dike. Wek wî bi hezaran kes hene, lê pêwîst nake mirov navê hemiyan bibêje. Di vir de a girîng xêzik e, gerek mirov li ser vê bisekine.”
Sêdiq ji dera han zend û milên xwe hejandin û herdu destên xwe bi hev re bilind kirin:

”Kuro Sîno, ka bise ka bise! Ê hema bi telaq min ne hişt ku tu li ser xêzê bisekinî heta ku tu di derbarê wî zilamî de tiştekî ji me re nebêjî. Erê ew Mao ye bê çî ye, çi bi serê wî zilamî kir, kuro? Lawo hema xwedê bike wî jî nekuje.”

Kerîmê ku navê gelek serokên dewletan dizanîbû ji

58

dera han peyivî:

”Sadiq hewce nake ew bibêjin, zilamê ku bikaribe jina xwe têxe hepsê, îcar bifikire û hew!”

Zibêr piştî ku got, ”kuro qey jinikê jê re ne dihişt”, dev li serê zimanê xwe kir û li Aydinê lawê xwe nerî. Aydin jî lê nerî, lêbelê dengê xwe ne kir.

Şoreş ji nav civatê bi çavê ê herî zana li xwe nerî û bi teqil peyivî:

”Partiya komunîstê mezin Mao, careke din peyitand ku serketin û neserketina partiyeke siyasî, bi rastî û ne rastiya xêzikên hatine danîn ve girêdayî ye. Xêzika rast her tim bi xêzikên çewt re di nav têkiliyên dijî xwe de dimeşe; bi wan re tekoşînê dide û li pêş dikeve. Gava ku dizê malê ji malê be mal xerab dibe; oportunîzm nexweşiyeke hindurî ye û her ganêrê malê jî dikare bi vê nexweşiyê bikeve. Vang Mîng di salên dawiyê de ketibû bin tesîra felsefa Konfuçyus û Mençîyus û endamên partiyê ber bi îdealîzmê de dibirin. Heq kiribû.”

Aydin bi helwesteke temam:

”Li gora zihniyeta totalîter rast e, heq kiribû.”

Bişar bi haweyekî ji xwe razî:

”Li Ernawîtê Seyfullah Maleşova jî bi nexweşiya wî
ketibû. Di kongra 1946an de bi zimanekî vekirî digot
‘gerek ev sîstema me a demokratîk wek demokrasiya burjûwazî
bixebite, da reqabet têkeve nav insanên me û welatê
me dewlemend bibe.’ Ajanên emperyalîstan incex dikarin
van gotinan bikin. Baş bû ku komunîstê mezin Enwer
Xoce zû rê li ber girt û ew ceze kir.”
Sînên destê xwe hejand:
”Baş e, ew ajanê emperyalîstan bû yan na me fêhm kir,
59
ma bi dehan ên wek Koçî Çoçe jî ajanê emperyalîstan bûn
ku Enwer Xoceyê te îşê hemiyan qedand, hi?”
Restem bi dû ku got, ”ajan bû û ajanekî pir mezin jî bû!
Koçî Çoçe û Pandî Krîsto troçkîst bûn”, li Berces nerî û di
cih de gotina xwe birî.
Aydin hema bi peyva wî re:
”Îcar ji Bihemd Şêxo re tu ê çi bibêjî?”
Mela Salar veciniqî:
”Te got çi? Çawa dikarin Bihemed Şêxoyê ku pêşmerge
bi stiranên wî êrîşî ser kozikan dikirin, bikujin!”got û
xwe aciz kir.
Serdêr bi qerf:
”Seydayê delal, gerek tu zanibî ku ew Bihemed Şêxoyekî
din e. Bihemed Şêxoyekî wan jî hebû. Ma ne ew jî
misilman in, wey.”
Gotina wî li telê Kenêr ket:
”Ez dixwazim pirsekê ji we bikim”, got û li bendî bê
ka ew ê çi bibêjin ne sekinî.

”Partiya Hoybonê li ku û di kîjan salê de avabû û serokê
wê kî bû?”
Hemiyan di bin çavan re li hev nerîn.
Kenêr dîsa pirsî:
”Mîr Celadet Bedirxan kî ye?”
Şoreş:
”Apê me jî pirsnan wisa ecêb dike ku kesek ji me nizanibe.”
Serdar:
”Em zanibin wê bibe çi yanî (!) Ji me re çi kirine? Dev
ji wan berdin.”
Heyva ku di nav devjenga wan re hilatibû, bejnekê
60
bilind bûbû û mîna xincereke soranî xuya dikir. Stêran ne
diçirisandin. Şewqa heyvê di tahtên qesrikê de xwe dabû
ser kavilên Sirêçkê û di qesra Girdo de gihabû hev. Qesra
wî mîna hêkê sipî xuya dikir. Sîha xaniyan, di kendalên
bestê de wek pozê zinaran kişiyabûn. Hindurê bestê mîna
teniyê bû. Zarokan bi tûştê dilîztin û xwe di ber taldeyên
dîwaran de vedişartin. Kûçikan mîna ku hîn jî li hev ne
kiribûn, di navtaran de piyasê dikirin. Heger ne ji wan dusê
kûçikên ku kêfî direyan bana, belkî ji zû de jî li hev kiribana.
Çend kûçikên dengnas wê her ji bênikekê bireyana
û ên din jî hemû têketana nav hev. Ne dengê pîrekan û ne
jî dengê giriyê zarokekî ji dergûşekê dihat. Sirûşta ku bi
şevê pir comert dibû; di nav bayê xwe ê hênik de bêhneke
xweş difûrand.
Serdêr û Sînên bi haweyekî hişk rahiştibûn hev. Lê
piştî ku civatê bi devjenga wan nerehetiya xwe da der,

wan jî ji mecbûrî wek ku civatê dixwest kir. Êdî mîna berê ne xwe zirzitandin û ne jî mîna qereçiyên derdora Nizîp û Rihayê bi ser hev de kirin şîqe şîq.
Şoreş got:
”Mesela şoreşê a herî bingehîn ku desthilatdariyê bi dest bixîne. Û ev yeka han jî incex bi rêya sîleh dibe. Marksîzm û lenînîzm vê diparêze. Ên ku vê rastiyê qebûl dikin şoreşger û ên ku nakin jî ne şoreşger in, ewqas.”
Aydin û Sînan bi hev re gotin:
”Marksîzm û lenînîzim ne dogmatîzm e. Li gora şertên welatan bi kar tê. Desthilatdarî li welatekî dikare bê sîleh û li yekî jî bi sîleh bê stendin.”
Serdêr ji dil got:
”Hûn sovyetî ne. Li gora îdeolojiya we gerek welatên
61
sosyalîst û emperyalîst, karker û burjûwazî bikaribin wek biran bi hev re bijîn. Gerek em bi a Krûsçev û Birejnev bikin û Politîka-Detant bi kar bînin û bi sînorên Rohilata Navîn nelîzin. Gerek em bi tirkan re şer nekin heta ku tirk bibin insan... Her şoreş bi devê tivingê dibe...”
Sînan:
”Helbet em wek we ne şerxwaz in. Gelê me bi rêya aşitiyê dikare heqê xwe bi dest bixe...”
Bişar henekên xwe pê kir:
”Yaho hûn li çola Sehrayê li berfê digerin, hayê we ji dinyayê tuneye. Ji vê dinyayê tu dikarî nimûneyekê bidî min ku karker û gundiyan bê şer desthilatdarî filan stendiye, hi?”

Sînên nimûne neda, lê bêdeng jî nema:
”Karker û gundiyên dinyayê û bi taybetî jî ên Ewrupa-Roava tu carî ne bûne marksîst heta ku bikaribin bê xwîn desthilatdariyê zeft bikin...”
Aydin xwe di ber re rakir:
”Mesele şîlî. Alende bê xwîn desthilatdarî zeft kir, lê heq jê derneket.”
Ji bilî Sînên hemû pê keniyan. Hin gundî jî bi kenê wan keniyan.
Restem:
”Zaradov û Sûslovê we bila pê ve biçûna. Mêrik ‘Detant politîka’a wan bi kar anîbû. Başkan Mao bi derewan ne gotiye ku ‘iqtîdar di devê tivingê de ye’ Kî xurt be paşa û siltan jî ew e.”
Seyitxan ji dera han:
”Rast e, ku ne bi darê zorê be mirov nikare here ba jina xwe jî!”
62
Civat tam keniya.
Mîrzo di bersiva wî de:
”Bi telaq ku jinikê ji te re bihişta te wilo ne digot, lo!”
Civat ji kenan li piştê ket. Hin ji ber kenên xwe pir kuxuyan.
Remo xwe avêt pişt Mîrzo:
”Ma wê çawa jinik jê re bihêle bavê mino, mêrik har e. Jinik ji hev de xistiye. Ma hûn nabînin bê xanima wî çawa şahto mahtî dimeşe!”
Xelef qaşo xwest ku rê li henekpêkirinan bigire. Lê bi

gotina wî re civat tam ji ser xwe çû û ji ken derbasî hoqeboqê bû.
”Bavo ne hewara qu...ê jina we ye, ka bihêlin bila birayê me Rûreş ji me re bipeyive, weh!”
Di vê carê de gotina wî tam li hesabê Heso hatibû. Piştî ku li Sêdiq guhdarî kir, dîsa keniya û çavên xwe zîvirandin ser Xelef:
”Kuro Xelef, Xelef, lawo navê wî ne Rûreş e, Şoreş e weh!...”
Berces di cihê xwe de diqeliqî. Di dawiyê de xwe ne girt:
”Ev partiyên sovyetî ne felsefeya marksîzmê û ne jî tarîxa marksîstên ewrupî dizanin. Ma Roza Luksembûrg, Karl Lîbcnet û temamê spartakusiyan dest avêtibûn sîlehan ku emperyalîstan ew di xwînê de fetisandin, hi? Na... Komunîstên macarî bi haweyekî barbarane hatine kuştin!... Li temamê Ewrupayê komunîst hatine kuştin... Îcar dema ku komarparêzan li himber faşîzma Franko şer dikirin, Stalîn jî ajanên xwe şandibûn Spanyayê û troçkîst dikuştin.” Piştî ku bi keder got, ”bi rastî jî halê me kurdan
63
wek hewa Swêdê ye”, civat ji wan re berda û keserek veda.
Kûçikan li ser bereta mîha ku li bestê bû pevdiçinîn û bi pevçûn û pevçûn ber bi bênderên pişta gund ve dihatin. Zarokan jî dev ji lîstika xwe berdabû, li wan kom bûbûn û ew hîn bêhtir li hev sor dikirin.
Dengê zarokan bala Şoreş kişandibû. Çixareyek pêxist

û bi civatê re peyivî:
”Erê, hûn dibînin bê zarok çawa bang kûçikên xwe dikin? Navê kûçikên wan Zinar û Çiya ye. Howeh li vê ecêbê, em miletekî ku ji destê zilma tirkan newêrin navê kurdî li xwe bikin, îcar em li kûçikên xwe dikin û partiya PSMK û PRKK jî wê bi metodên aşitiyê doza vî miletî ji van zaliman re bînin zimên!”
Sînên bi xwe ne xweş anî:
”Tu demagojiyê dikî. Di programa me de şerê çekdarî jî heye. Lê me ew avêtiye plana dawî. Berî şer, pêşî divê em xelkê xwe jîr û zana bikin û temamê rêyên demokratîk bi kar bînin. We marksîzm-lenînîzm çewt fêhm kiriye. Kurdistan ne Çîn e ku hûn bi zihniyeteke Maoyî rabûne ser xwe. Partiya te û Serdêr, Bişêr û Restem bi şerekî hindurî daketiye û kurdan berdidin pêxêla hev...”
Piştî ku Aydin got ”ê me, em tu carî nabin hevalê şer; ji ber ku şerê herî piçûk jî dikare welatekî herî mezin xerab bike; şer mirov bi ser barbariyê de dibe”, Şoreş peyivî:
”Şoreşa kominîstên Çînê, ji sala 1921ê heta sala 1949an tam di çar merheleyên tarîxê re derbas bûye. Bîst û heşt sal girtiye. Merhela pêşî bi haweyê şerê hindurî dest pê dike û agirê şoreşê pêdixîne, a duduyan şoreşê bi şerê
64
reforma erdan disincirîne, a sisêyan şoreşê bi şerê li himber milîtarîzmê diqemirîne û a çaran jî, şoreşê bi şerê ji bo bidestxistina desthilatê dikelîne. Ev lênerîneke stratejîk e. Lê wek ku Başkan Mao û Reyis jî dibêje, di pratîkê de şerê van herçar merheleyan gerek her tim bi hev re bimeşe. Wî

wiha kiriye û bi ser ketiye. Em jî divê wiha bikin.”
Aydin:
”Tu û partiya te hûn ji bîra dikin ku welatê me bi her haweyê xwe ji Çînê cihê ye. Li Çînê Çankay Şeyek hebû. Çîn nîv dewlet bû û zimanekî çînî hebû. Li Kurdistanê tiştekî wilo tuneye. Dewleta tirkan bi qasî ku dijminê min û te, ziman û kultura kurdî ye, ewqasî jî dijminê axa, beg, şêx û melayên Kurdistanê ye. Doza me miletî ye, divê em deriyê şoreşê ji her kesî re vekirî bihêlin. Û heta ji qehbikan re jî!”
Serdar:
”Helbet şerê me miletî ye. Lê divê mirov vê jî tu carî ji bîra neke:
Li Çînê mirovên burokrat, komprador, axa û keşe her tim li himberî şoreşê sekinîne û digel emperyalîstên japonî heta bi dawiyê şer kirine.”
Şoreş bi haweyekî devlikenî:
”Rast e, teza ku di labratowara şoreşê re derbas bû, hîç pêwîst nake mirov careke din bîne labratûwarê. Axa, beg, şêx û burokratên kurdan tim û dayim bûne xayin bûne!”
Mela Salar bi wahc û bahc got:
”Na, ez vê yekê qebûl nakim! Qadî Bihemed alimekî maqûl û heta hûn bibêjin jî kurd bû. Wî tu carî xayintî bi miletê xwe re ne kiriye û di ber miletê xwe de hatiye kuştin.”
65
Serdêr ne hişt ku Salar peyvê bidomîne:
”Rast bû, hate kuştin lê di ber axa û began de hate

kuştin. Stalînê mezin bi sebeba ku ew jî bibin insan, dewleteke kurdî ji wan re çêkir...”
Şoreş dizanîbû bê wê dû re çi bigota. Xwest ku ew mazinahî ji wî re be. Xwe nepixand û bi lez got:
”Heger Qadî Bihemed erd li gundiyan belav kiriba, yanî toprak reformî çêkiriba, tu carî dewleta wan têk ne diçû. Lê...”
Piştî ku telebeyan hemiyan gotina wî sediqandin, ew jî bêhtir ket çav xwe û xwe lê berda:
”Berî dewleta tirkên faşîst, em divê bi axa, beg, şêx û melan re şer bikin. Ji xelkê me re tiştekî bi rûmet ne kirine.”
Restem da xwe:
”Îcar heval di vir de em wek we nafikirin. Ji ber ku sosyal-emperyalîzma sovyetî bi lez li pêş dikeve û bûye emperyalîzmeke serekî, berî dewleta Tirkiyê gerek pêşî em bi vê emperyalîzmê, axa, beg û şêxên Kurdistanê re şer bikin.”
Bişar hîn mezintir peyivî:
”Na, em wek we nafikirin. Ji ber ku emperyalîzma emerîkî û rûsî herdu jî pir bi hêz in û bi hev re dinyayê tazî dikin, gerek em jî bi herduyan re şer li dar bixînin…”
Circîs xwe ne girt:
”Kuro hûn tiştinan wilo ecêb dibêjin ku aqilê mirov qet nikare qebûl bike! Berzaniyê ku temamê kurdan dabû dû xwe û bîst-sîh salî bi dewleta Iraqê re şer kiribû têkçû, îcar em ê çawa bê tenq û top û teyare bikaribin bi Urûs û Emerîkayê re şer bikin! Ev hûn çawa insan in, we aqilê xwe
66

xwariye, mejiyê we leqiyaye, çi bi we hatiye!...”
Civat jî li hêviya bersiveke wilo bû.
Heso da ber Circîs:
”Li vê dinyayê ji mêrê ereb gendelîtir mêr tune ne.
Berzanî nikarîbû bi wan re serî derxista, îcar em ê çawa
bikaribin serî bi gunmezin û ganêreyên wek...”
Restem mîna ku li çûra kaban bixîne, nehişî peyivî:
”Hûn ‘eskî kafa’ne, apo. Ûşaxên emperyalîstan hûn
çavtirsandî kirine; heqê we heye ku hûn van gotinên neşoreşgerî
dikin...”
Heger Kenêr ne gotiba ”apê Heso û Circîs jî fikira xwe
dibêjin”, Restem wê bi dest û lingan bida nav û pîsiya
emperyalîzmê di ruyê temamê civatê de bidaya.
Ji her kesî bêhtir Şoreş kêfa xwe bi gotinên wî anîbû.
Tiştê ku wî dixwast û nikarîbû bigota, Restem gotibû. Li
gora wî, Restem dilê civatê ji telebeyên gund sar kiribû û
civat ber bi wî de ajotibû. Dilê wî sivik lê dixist. Di bin
simbêlan re dikeniya û bi haweyê ku wê çawa bikaribe
Serdêr li koncalê biqelibîne, bi çavekî dijminane lê dinerî.
”Li gora marksîzmê her komunîst, gerek pêşî ji gundê
xwe dest bi her tiştî bike”, got û dengê xwe birî.
Bekir çarmêrkî rûnişt, serê xwe bilind kir û destê xwe
ê rastê hejand:
”Wisa ye. Pêşiyên me jî tiştekî bi rûmet ne kirine, ev jî
wisa ye; lê we ji xelkê me re çi kiriye gelo?”
”Gerek hûn vê pirsê ji xwe bikin. Baş e, ez ji we re dibê
jim, we heta niha çend xayin û ajan kuştine, hi?”
Serdêr di bersiva Şoreş de:

”Hema berî niha bi şeş-hevt rojan me li Nisêbînê Dimsoyê Erebecî kuşt. Ajan bû.”
67
”Me jî eyarfiroşê omerî ku xelkê şika muxbirçiyê jê dikir, li kolana Qijlê kuşt.”
Bişêr berê xwe da Şoreş:
”Tu derewan dikî, ê ku eyarfiroşê omerî kuştiye partiya me ye!”
Restem sor û mor bû û bi hêrs destê xwe li ba kir:
”Îcar hûn çima behsa kiryara partiya min nakin, ev çawa şoreşgerî ye, yaho! Temamê nisêbîniyan pê dizanin ku me, dikana wî zêringerê kevneperest tazî kiriye...”
Stêrkan xwe ji dor heyvê dabûn alî û ji dûr ve pê re dilîstin. Elektirîkên Nisêbînê û Qamişlê bûbûn yek, Nisêbînê wek bajarekî mezin diket çavên mirov. Ji ser odeya Heso, elektirîkên Amûdê winda bûn; lê mehsera bajêr mîna agirê Newrozê di ezmên de xuya dikir.
Serdêr û Şoreş wek du kewên şingalî dabûn ber hev û civatê jî bêdeng li wan guhdarî dikir. Yekî ji yekî danedixwar; car carê xwe ji hev aciz dikirin û bi ser hev hildibûn.
Şoreş piştî ku bi kenekî xemgîn got ”we, li Xanika Cizîrê qaz û ordekên hevalbendên me kuştibûn. Ma mirov çîçik û mîçik û mirîşkan dikuje!” li Circîs nerî.
Serdêr ruyê xwe tirş kir:
”Mirîşk dibe, çi dibe bila bibe, li gora marksîstê mezin heval Stalîn, tiştê ku zerarê bide malê gel, divê bê kuştin. Qaz û ordekan ava gola gund dilewitandin.”
Berces bi qerf got, lê wan fêhm ne kir.

”Îcar kê ji we şêxê Bizgûrê kuşt?”
Şoreş xwe nepixand û eniya xwe xurand:
”Me ew cahş kuşt!”
Bekir xwe jê bêhtir nepixand:
”Me jî şêxê Enkafê kuşt!”
68
Lê gundiyan baş pê dizanîbûn ku şêx, li nav rez ji ber
wan ber bi gund de reviyabû û bi rê de dilê wî sekinîbû.
Restem bi haweyê ku ji dawetê maye û hindik maye
dawet xelas bibe:
”Tam di neqeba ku ber bi Heskîfê de dadikeve, me li
Şêxataullahên batmanî girêda, lê çi fêde zû bi me hisiyan
û xwe ji texsiyê avêtin...”
Bişar tiliyên xwe di hev re derbas kirin û bi dengekî pêt
peyivî:
”Me jî çend meh berê li Enqerê, miftîyekî kevneperest
kuşt.”
Mela Salar piştî ku çavên xwe kutkutandin, bi ruyekî
sar û qermiçî di ber xwe de got, ”hema Xwedê bike ew
miftî tirk be”, xwêziya xwe daqurtand û li ezmên nerî.
Dengê wî çû wan, lê tiştek jê re ne gotin.
Sînên bi qahr:
”A ku hûn dikin ne pêkanîna şoreşê, têkbirina şoreşê
ye. We dest dirêjî erdê axa û şêxan jî kiriye û hûn li gundiyan
belav dikin.”
Bekir rabû ser herdu kabokan û bi teqil peyivî:
”Ma ku em ji niha ve erdê axan li gundiyan belav
nekin, em ê kengî vî karî safî bikin, efendim! Şoreşa me

demokratîk û milî ye. Aliyê wê ê demokratîk xwedî erdan
û aliyê wê ê milî jî milîtarîzma tirkan hedef digire...”
Serdarê ku tiliya xwe xistibû devê xwe û nenûka xwe
dikoja:
”Me xwest ku em li Batmanê erdê Mala Çelqê li gundiyan
belav bikin. Lê esker anîn ser erd. Par bi qeweta
eskeran çandinî kirin, me jî agir berdayê. Îsal jî beyar
maye. Ne em dikarin û ne jî ew dikarin biajon.”
69
Şoreş bi haweyê ku qerfê xwe pê bike tevgeriya, lê wî
jî wek wî got:
”Me jî li Hîlwanê axayekî sax ne hişt; heta bi zarokên
wan jî me kuşt. Îcar piştî ku gundiyan li ser erdên wan
girêda, bi hezaran esker kişiyan ser erdan û gundî hemû
girtin. Ew erd ji ber ku îro bêxwedî mane, dewletê jî hemû
kirine malê xezîneyê. Kes nikare biajo. Bi kurtî ez dikarim
bibêjim ku me li Hîlwanê şoreşa xwe a demokratîk qedandiye.
Di pêşerojê de gava me dewlet bi carekê ve ji wir
derxist, em ê bi hêsanî bikaribin wan erdan li gundiyan
belav bikin.”
Heso bi haweyê ku şîretekê li wan bike peyivî:
”Bi xwedî erdan, axa, şêx û esnafan re şer nekin; ev
welat bi wan heye. Ew hevalên kê bin, ew ê bi ser bikevin.
Îcar hema Xwedê aqil bide we û hew!”
Aydin ji gotinên Heso cesaret girt. Piştî ku dîsa qerewata
xwe ediland û dengê xwe rakir:
”Apo, ev macaracî ne! Felsefeya wan a xerabkirinê ye.
Heger di demekê de lê bê û wek wan bibe, wê ev zir welat

bi carekê ve xirîxopan bibe û nan ji tu kesî ji me re nemîne”, zor bi qirika wî hat û zimanê wî ê piçûk nema çerx kir.
Civat pê keniya. Hema pê re ew jî rabû ser xwe û çû. Dengê Aydin û qilafetê wî ê girs li hev ne dikir. Dema ku dengê xwe hildida û bi hêrs dipeyivî, dengê wî dibû wek ê zarokan, mirov digot qey henekan dike. Bi serê xwe ê mezin û lêvên xwe ên qalind, dişibiya fêrisên kurdan. Ji dûr ve tam kubar xuya dikir. Ji nêzîk ve jî wilo bû. Li gora zihniyeta partiya wî qerewat, sembola medeniyetê bû. Û her endamên partiyê jî mecbûr bû ku bi vê sembolê him
70
bigeriyana û him jî di civatan de rûniştibana.
Şoreş gotina Aydin cidî ne girt. Berî ku hin tiştekî bibêjin, wî berê xwe da Serdêr:
”Hûn araqê vedixwin û cilên xweşik li xwe dikin.”
”Tu derewan dikî! Me jî araq qedexe kiriye, lê hin heval carina bîrayekê-duduyan vedixwin. Û cilên li ser hevalên me jî dibin ku mîna ên we ne ewqasî bi pîne bin, lê hemû kevnik û mevnik in.”
”Hûn çixareyên Marlboro, Samsûn û Maltepe dikişînin.”
Serdêr dîsa a berî niha got:
”Tu derewan dikî!Em jî wek we çixareyên bitlîs, birîncî û tûtinê dikişînin...”
”Gerîla pezê xelkê ser jê nake û naxwe; lê hûn bi gundiyan pez ser jê dikin.”
”Ev jî derew e! Li gora qerara partiya me jî, ji hevtê carekê endam derdikevin çiyê, xwe berdidin ber çeman û

mar, beq, kosî, kevjal û kêzikan dixwin.”
Serdêr ava han rast gotibû. Çend hevalên wî li ber çemê Bonisra çend kosî, beq û kêzikên gûgerîn xwaribûn û hemû jî bi jahrî ketibûn. Yek ji wan miribû.
”Hûn diçin aşxaneyan û goşt, kebab û pîrzola dixwin.”
Serdêr destê xwe lê hejand:
”Tu bextê xwe xerab dikî! Partiya me berî a we ji zû de aşxane li endamên xwe qedexe kiriye.”
”Esker û polîsên tirkan her roj sê-çar kesên kurd dikujin û hûn jî di dawetan de direqisin”, Şoreş got û çavên xwe li ser civatê gerandin. Guhên civatê ji Serdêr bêhtir li ser wî bûn.
”Tu mirovekî derewîn î! Me wek we, li gelê xwe dawet
71
hîn qedexe ne kiriye, lê em di dawetên wan de nareqisin jî.”
Şoreş bi haweyekî ji xwe razî:
”Li ser pêşniyara Reyis, partiyê zewaca hevalan qedexe kiriye.”
Sînên xwe aciz kir:
”Hûn klînîk in, pêşî herin ba psîkolokan xwe tedawî bikin. Ma ku keç û xort bi hev re nezewicin ”, a bi dû de negot û bi wahc ji civatê rabû.
Serdêr piştî ku jê re got ”heger em klînîk bin, hûn jî zir klînîk in. Tirk gergedan e û hûn jî ji vî gergedanî doza heq û hiqûqê insên dikin” û berê xwe da Şoreş:
”We li ser navê me nameyek ji Sebriyê nisêbînî re şandibû ku Sebrî, keça xwe bi êvarkî re ji we re bîne bin pira

Eleman.”
”Tu bêbextiyan dikî!”
”Na, ez bêbextiyê nakim, me hevalên we li bin pirê girtin. Şahidên me pir in.”
”Heta niha we nozdeh hevalên xwe kuştine, ma ev jî bêbextî ye?”
”Erê bêbextî ye, û tam jî bêbextî ye. Me hin kujtibûn. Lê me ne nozdeh, me neh hevalên xwe ên ku dev ji partiyê berdabûn, kuştine. Bi rastî hemiyan jî ew kujtin heq kiribû. Mirov di nîvê rê de dev ji hevalên xwe bernade û nareve. Him a wa ne rev jî bû, mêrikan ajan bûn...”
Bûbû derengî şevê. Lê gundiyan dîsa jî dev ji civatê bernedidan. Destê wan jê ne dibû. Dewlemendiya ji salên 1970î û vir ve û tevgera telebeyan, stûnên kîn û dexsa sed salan di zindana mejiyê wan de xistibû û bi vê devjenga îşev stûn hêdî bi hêdî rabûbûn ser xwe. Kengî diçûn mala
72
xwe! Her kesî bi meraq li wan guhdarî dikir. Car carê wan jî a di dilê xwe de dikirin qerf û digotin, lê telebeyan jî qet rû ne didan wan.
Kenêr rabû ser xwe ku here malê. Heso û Circîs bi hev re jê pirsîn:
”Ma aqilê te ji dîwarên qesrê birî?”
”Dîwar bi zilaman lêdibe”, got û bi lez xwe di neqeban re berda.
73
BEŞÊ ÇARAN
1

Zorava ku di serê dimdim de hatibû ava kirin, ji aliyê bakur bi qelêç û ji aliyê başûr ve jî bi deştê re dibû yek, bûbû qada şerê PKGK û PKPKê. Ji aliyê roava û rohilat ve gund bi dimdim re bilind dibû û ji herçar aliyan ve diket derba tivingê. Ji dûr ve qesra Celîl û Circîsê ku mîna du hêkan di valahiya ezmên de sipî diyar dikirin, bi arpiciyeke efrîkî jî dikarîbûn bihatana hilweşandin. Heta bi guleyên eskeran di salên şêstî de ji vî gundî pîrejinek û ji Sirêçkê û Sarincê jî du zarok bi şev li ser xaniyan hatibûn kuştin. Ev gund ji Tûgaya Mêrdînê 60 kîlometreyekî dûr bûn. Sînorê Serxet û Binxetê di ber van gundan re derbas dibûn û li ser sînoran jî bi sedan esker seraqet hebûn. Û ji xwe ji tabûra Nisêbînê heta bi Zorava jî çend kêlîk bûn. Lê digel vî haweyî dîsa jî amirhêzên herdu partiyan, ev gund cihekî stratejîk dîtibûn û bi qeweteke giran kişiyabûn van gundan.

Di hikmê sê salan de bûblaniyan jî wek omerî û toriyan ji kultura xwe a eşîrî gelek tişt winda kiribûn. Bûblaniyan ji dawetan hez dikirin, lê dawet rabûbûn. Guheztina bûkan bê xêlî, teqîn û şahî dibû. Keç û xortan dê û bavên xwe bêminet kiribûn; wan hevdu dihecibandd. Û bi ser de jî li pêş çavên dê û bavên xwe diçûn civanên hev! Piçûk û mezinan her kesî ji hev re digotin ”heval.” Lê gava yekî negota jî ne sûc bû. Keç û xortên malmezin û malpiçûkan bi hev re dizewicîn û piştî du-sê mehekî jî hevdu berdidan. Hin jinan bi çavên jinên bajariyan li xwe dinerîn; sergira-

74

nî li mêrê xwe dikirin û bi gotinên çort diajotin ser wan.

Heta car carê şekal jî di wan werdikirin. Di paqijî û sixlet, xawrin û vexwarin, lixwekirin û dan û stendina wan de wek hevî pêk hatibû. Bi dorê her roj li mala gundiyekî taştê, firavîn û şîv dixwarin. Def û zirne, ribab û tembûr qedexe bûbûn. Çekdaran Bihemed Arifê Cizîrî, Kawîs Axa, Îsa Berwarî, Meyremxanê... bi mebesta ku avêtibûn ser axa û begên kurdan ”kurd-xayin” ilan kiribûn û kasetên wan şewitandibûn. Gundî her şev li mala yekî diciviyan û li ber dengê erbanê û tenekeyê bi dorê dûrikên qehremaniyê digotin. Stiranbêjiya di vî warî de hema hema bûbû mecbûriyetek.

Şerma li ser zimanê tirkî rabûbû. Tirkî li temamê gundan serbest bûbû û bi ser de jî wek zimanê jîr û zanahiyê hatibû naskirin. Keç û xort li himberî dê û bavên xwe bi tirkî dipeyivîn. Şêxan ji ber şêxitiya xwe û melan jî ji ber melatiya xwe ketibûn ber fediyê. Dijminên wan ji ên Ebû Sufyanê ereb jî pirtir bûbûn. Beg û axan ji tirsa ku neyên kuştin nalet li beg û axatiya xwe dianîn. Gavantî û şivantî jî mîna bangdana mela ji gundan rabûbû. Her kes diçû ber heywanên xwe. Xwedî erdan çandinî dikirin û çandiniya ku ji wan re dihat jî bi cîranên xwe re li hev par ve dikirin. Sîleh û fîşekên gundiyan bûbûn malê herdu partiyan. Cîranên ku nikarîbûn demaçeyek bi dest bixistana, wek xwedî erdan hemû bûbûn xwedî keleşkof. Ji ferqekê pê ve tu ferq di nav wan de ne mabû. Û ew ferq jî ev bû: Şêx, mela, maqul, axa û beg, dizanîbûn kubar bipeyivyana, ewqas. Guhertineke mezin ketibû Zorava jî. PKGK û PKPK li gora marksîzma xwe gundî beş bi beş kiribûn: Ji hinekan

re ”pêşverû” û ji hinekan re jî ”paşverû” digotin û bi
75
haweyê pêşverû û paşverûtiyê bi wan re dimeşiyan. Navê Mihoyê ku ji ser sifreya xwarinê goşt didizî, bûbû ”Proleter Mihê.” Mala wî jî ji xaniyên kelpîçî kişandibûn mizgefta gund. Ji Birehîmê ku temamê erdê xwe bi tahmtîtkên etaran firotibû re ”Karker Birehîm”, ji Zibêr re ”Apê Zibêr” digotin û qedrekî mezin didanê. Heso û Circîs bûbûn ”tirsonek” û Luqman û Hesûk jî bûbûn ”qehreman.” Li Mela Salar, Erol û Sêdiq bi çavekî xayinane dinerîn. Erol mîna salên berê, nema dikarîbû li gund araq vexwara. Xwe ji gund vedidizî, diçû Mêrdînê û li sûka kurtankeran vedixwar. Sarê ji gund reviyabû Cizîrê û li ba zavê xwe dima. Kenêr mala xwe barkiribû Nisêbînê. Partiya Reşo û Serdêr, digel xortên ji xwe razî, henûn û kemlan, temamê xortên ku li sûka Nisêbîne tolazî, dizî û pêxwasî dikirin jî, xistibûn nav xwe û navê wan kiribûn ”proleter-komunîst.” Kuştina hin kesên ku ji teref xelkê ve bi rastî muxbir dihatin zanîn, belekir û barûteyên bajêr xistibûn ber fediyê û ew ajotibûn nav refên şoreşgeran. Şoreşgerên ku xelkê di demekê de bi çavekî mezin li wan nerîbû, ji kesên ku di belediyan de paqijiya bajêr dikirin ”proleter” û ji ên ku nalbendî, etarî, beqalî û berberî dikirin re jî digotin ”zavalli-proleter.” Li her derê herêmê proleter-komunîst û zavalli-proleter bûbûn mezinên civatê. Dewlemendên herêmê milk û malên xwe bi carekê ve berdabûn û bi nav tirkan de beziyabûn. Hin ji wan jî hatibûn kuştin. Herdu partiyan her ji çendeyekî dikandar cirm

dikirin û bi mebesta ku dikandar dewletê protesto bikin, dikanên wan digirtin. Li Nisêbînê bi êvarkî re xelk diketin hinduran, lempeyên xwe vedimrandin û di nav livînan de nobet li xwe digirtin. Bi roj di kolanên bajêr de her kes
76
mîna eskerên ku ji îzbatan direviyan, li derdora xwe dinerîn û bi lez û bez dimeşiyan. Xort, keç, jin û mêr di nava sûkê de dihatin kuştin. Polîsan sûk, bi şev û rojê ji herdu partiyan re berdabûn. Endamên wan mîna eskerên hidûd, ji aliyekî ve digrtin ser malan û di hindurê malê de mirov dikuştin û ji aliyekî ve jî bi mal û pereyan ew cirm dikirin. Bêhna mirinê ji bajêr difûriya; şîn û girî girtibû her malê. Mirov ji tirsa ku nehatana kuştin, newêrîbûn derketana ser goristanan û miriyên xwe veşartana. Her kes ji yekî yek ji her kesî ditirsiya. Proleter-komunîstan agir bi ser Nisêbînê de dibarandin! Qîr û hewara dayik û bavan bû! Ew Nisêbîna ku bûbû dergûşa xwendekaran û ew di himbêza xwe de mezin kiribûn, di destên partiya Serdêr û Reşo de dinaliya.
Li Zorava jî proleter-komunîst û zavalli-proleter di qorzîbirên navtaran de bi sîleh disekinîn û kitêbên Mao û Stalîn ji hev re dixwendin. Zoravî dîsa hemû bûbûn dijminên hev û di bin nîr û kulaban re li hev dinerîn. Çûn û hatina eskerên tirkan ji ser gund hatibû birîn. Ne çawîşê Stilîlê û ne jî komutanên hidûd dihatin gund. Bi rastî jî ji hêlekê ve Zorava bi haweyekî miletî tevdigeriya û serbixwe dijît. Qedexeyên ku dewletê li vî gundî danîbûn, hemû jî binpê bûbûn. Ji Rihayê, Diyarbekirê, Batmanê û Colemergê

gelek xort li gund bi cih bûbûn û li her derê gund bi keleşkof û G3 digeriyan. Hoqeboqa keç û xortan bû. Keçinan mîna keçên ewrupiyan, bi qasî ku dikarîbûn her şev bi yekî re razana, xwe serbest û azad didîtin. Ji wê kultura bav û kalan hema hema tiştek ne mabû.

77

2

Ezman wek qubeke ji qirîstalê bû. Pelên dar û deviyan di bin tîrêjên roka ku mîna mirariyan bi ser dinyayê de belav dibûn, dibiriqandin. Mêw ketibûn zeharê. Bihar kabokekê rabûbû. Ceh seridî bûn. Nîsk zer bûbûn. Genimê sorgul û rûtik bin zikê hespên kihêl dialast. Simbilan şîrik girtibûn. Dengê qebe qeba nêrkewên margirosî di newalan de li hev vedigeriyan. Dar û devî bi bayê biharê re direqisîn û xuşînî bi newalan dixist.

Serdêr û hevalên xwe ji bo tetbîqatê, xwe di rext û fîşekan de girêdabûn û bi dûrbînê li tetbîqata ku Reşo û hevalên xwe li qelêç dikirin, dinerîn. Li gora peymana ku di nav xwe de danîbûn, Reşo divabû her roj seet li duwazdehê nîvro qelaç ji wan re berda. Lê ji dengê navtêdanên Luqmên, bombe, deremêt, arpicî û fîşekên ku bêwestan diteqiyan, xuya dikir ku Reşo wê dîsa li qelêç asê bûba û şerekî wek şerê şeş roj berê mezin derxistiba.

Hevalên Serdêr duryana gundê Qûzo û ên Reşo jî duryana gundê Cibiltînê zeft kiribûn û li cûzdanên gundiyan temaşe dikirin. Ji sibehê û heta êvarî karê wan ev bû. Birkoyê omerî û jina xwe jî ji gundê Xerêb dihatin û li kemîna Bekir rast hatibûn. Xerêb gundekî omeriyan bû.

Gund têra xwe ava bû.
”Hûn kî ne, ji ku tên û hûn ê herin ku?” bi hev re gotin
û bi hev re jî berê sîlehên xwe bi wan vekirin.
Xwîn li herduyan jî vemirî. Jinikê xwe li tena ne girt,
rûnişt û hema pê re jî xwe li erdê veziland. Mêrkujekî ji
van xof jê girt û bêhemdî xwe di ser wan re sê fîşek berdan.
Piştî ku Birko kire ”hewar hewar!” û mêrkujan jî ajo-
78
tin ser, Bekir qêriya:
”Na na, wî nekujin!”
Vê carê bi a wî kirin, ew ne kuştin. Fîşek jî ne teqandin.
Birko jî wek şivanê ku birûsk li tahta ber xîne, sênga
xwe bel kiribû, herdu destên xwe nêvcî hildabûn, behetî li
wan dinerî û behetî jî diqêriya:
”Ez ji Êstilê me, Êstilê!”
Êstilê bajarekî mihelmya bû û diket herêma Torê.
Mêrkujekî xwe aciz kir:
”Qûzo li ku û Êstilê li ku! Bênamûs, ma ne eyb e tu
derewan dikî, zimanê te omerkî ye!”
”Ê hema ez xêrê ji zarokên xwe nebînim ez mihelmî
me, mihelmî!...”
Mêrkujo xwe aciztir kir û bi haweyê ku lê xîne, qûndaxa
keleşkofa xwe bilind kir:
”Baş e, madem tu mihelmî yî bi mihelmkî bipeyive!”
Rebenê Birko bi mihelmî gotinek jî nizanîbû. Tam ji
ser xwe çûbû, bêyî ku bifikiriya bi zimanekî teriqî dipeyivî.
Pêşî devê xwe tev bir û anî, dû re sekinî û serê xwe
berda ber xwe:

”Kekê mino, wilehî û bilehî ji tirsan min zimanê xwe ji bîr kiriye; li min negirin. Ez xwedî birek kuflet û feqîrekî Xwedê me. Bihêlin da ez bi rêka xwe de herim...”
Mêrkujo di nava xwe de keniya, lê neda der.
”Zû bibêje bê tu ji kîjan partiyê yî?”
Li herêma Omeriya xelk bûbû du bend, bendek hevalê partiya Reşo û yek jî hevalê partiya Serdêr bû. Li herêma Torê jî wilo bûbû. Û Birko jî alîgirekî partiya Reşo bû. Bekir ew nas dikir. Lê wî Bekir nas ne dikir.
”De îcar ji xwe re li gotina wî binerin; ez û partî ha! Ez
79
yekî wilo me ku ez nikarim pê li gêrikekê bikim, îcar ez ê çawa bikaribim bi mêrxasên wek we re berberiyê bikim! Ez di bextê namûsa we de dev ji min berdin!...”
Bekir xwe hêrs kir:
”Qeşmer, zû bibêje bê tu ji kîjan partiyê yî!” û destê xwe lê hilda.
Birko ji ser a xwe ne hat xwarê:
”Ez ne ji tu partiyê me, ez ker lawê kerê me”, got û melûl melûl li jina xwe nerî.
Mêrkujekî piştî ku çend kulm li dev û ruyê wî xistin:
”Dua ji jina xwe re bike, me tu da xatirê vê pîrekê. Lê heger me tu careke din zeft kir û tu hîn jî ne bûbe hevalê me, ji xwe bizanibe ku Melkemot bavê te be jî tu ê ji nav destên me xelas nebî!...”
Birko xwe avêt destê wî ku maçî bike, lê wî destê xwe vekişand. Wî jî dilê xwe ne girt û bi lez û bez da pêşiya jina xwe. Heta ku qelaç jî xelas kirin li dû xwe dinerîn. Wê

biçûna Zorava, lê dabûn ser rêya gundê Sarincê.
3
Deng ji tetbîqata ku eskerên hidûd jî lê temaşe dikirin,
bilyabû.
Bêhna barûdê têkilî hewa biharê bûbû. Teyrikan nikilên
xwe bi qahr di erdê de dibirin û dianîn û neperûşk ji
serê xwe didan. Deng ji tiltivîkan ne dihat. Çêlkewên ku
nuh ji hêkê derketibûn, di bin baskên mêkewan de xwe bi
ser hev de qurnisandibûn; mêkew bi ser çêlkewan de xilmaş
bûbûn. Zelore û zinzinîk hîn jî ne hatibûn ser hêlînên
xwe. Şalûran mîna çûkan ji ber perên ezmên xuya dikirin.
80
Dengê wan bi zor dihat. Keroşk ji mexelê xwe reviyabûn.
Mar bi tirs ji qulên xwe derdiketin. Minminîkan li hewa ne
dilîstin; lê kêzik difiriyan. Gîhayê ku di sirta qelêç de
qamekê bilind bûbû, bi bayê xerbî re mîna pêlên behrê di
ser hev re diqulipî û diçû. Bêhna şewt û barûdê hawêrdor
difûriya.
Hevalên Reşo xwe berdabûn aşkê Cinan û di kemînê
de rûniştibûn.
Aşkê Cinan ji Zorava xuya ne dikir, lê ewqasî jî ji gund
ne dûr bû. Navbera vir û cihê ku Reşo lê ”tetbîqat” dikir,
li dor kîlometreyekê incex digirt.
Şeş çekdar ji wan bi keleşkof, yek jî bi G3 bû. Sê
bombe û çar qezetore jî bi wan re hebûn. Yek jin bû. Ji bilî
komutanê wan Kenan Arikan, hemû jî kurd bûn. Xeca diyarbekirî
dibistan ne xwendibû, lê bi tirkiya sikakê dizanîbû.
Ji herpênc xortan sisêyan jê lîse qedandibûn. Ji herduyên

din yekî jê bi tirkî hema hema xwe xelas dikir û ê
din jî digel tirkî hinekî bi mihelmkî jî dizanîbû. Ev
nisêbînî bû. Ji herçarên din dudu jê qosarî, yek xerpêtî,
yek jî rihayî bû.
Mirov digot qey têgeha paqijiyê ji bîr kiribûn, ji her der
wan hilma genî difûriya. Xwêhdana piştê, mîna sînorên
împaratoran li qutikê wan vedabû. Him jî ji dûr ve xuyanî
dikir. Di lingên hemiyan de solên meqabê hebûn. Sola
Qadirê xursî ji a hemiyan kevintir û a Kenan jî ji a hemiyan
nuhtir bû. Çefiya wî jî ji ên hemiyan sipehîtir bû.
Qutikê hevirmêrş, ji wî pê ve li ser kesî tune bû. Şerwalê
Xecêya ku pênc-şeş meh berê mêrê xwe kuştibû û beşdarî
nav refê partiyê bûbû, bi navran bû. Xecê wek balîfka
mêr qut û qalind, piştpehnî û rûbizinî bû. Tilmiqûnên wê
81
dişibiyan tekerê texsiyan. Memikên wê wek du eyarşîrkan
bel bûbûn. Ne ji memikên wê ba, mirov tê dernedixist ku
jin bû. Di kêleka Qêdir de li ser qerevîzkan rûniştibû û
destê xwe danîbû ser ferşê kaboka wî.
”Hiş dengê xwe nekin, bila tam di kemînê kevin”,
Kenanê bi G3 got û hemiyan bi hev re keleşkofên xwe xistin
zikê wan.
Hemoyê kelehî û Reşîtê cizîrî bûn. Ji gundê Şahbanê
hatibûn Cibiltînê, li çolbirê xistibûn û wê biçûna Zorava
ba Serdêr. Kazim ew bi qasidiyekê şandibûn. Reşît pêncî
û yek salî, qut î girover, çavkizwanî û rûçaroxî bû. Serê wî
jî li gora serê ên xelkê herêmê mezin bû. Lê Hemo xortekî
çîçelaskî, dirêj û esmerekî xwînşêrînî bû. Xeta simbêlan

nuh rast kiribûn. Di sala çûyî de beşdarî nav refên PKGKê bûbû. Xortekî kelgerm û ewqasî jî mêrxas bû. Careke din jî li Qosarê ketibû kemîna hevalên Reşo û bi teqîn û teqînê xwe xelas kiribû. Lê di vê carê de feleka wî çewt zîvirîbû, ji xafil de ketibû kemînê û bi xwe re ne gihabû ku dest biavêta keleşkofa xwe.

Piştî ku Kenên deftereke piçûk ji paşila xwe derxist, rahişt qelemê û got ”ê xort ji dest û lingan girêdin” û hevalên wî jî ew di cih de bi şerîtan girêdan, berê xwe da xortê nisêbînî û bi tirkiya xwe a delal dewam kir:

”Min ji te re çi got, tu ê jî wilo bikî, temam?”

Mûsoyê ku li Nisêbînê bi Hemo re du sal orte okûl xwendibû ”temam”, got û çik sekinî.

Kenan ji dûr ve kinekî giroverî dixuya. Lê mirovekî ne kin û ne dirêj bû. Bi simbêlên xwe ên qalind, rîha xwe a melkesî û porê xwe ê evorî dişibiya homoseksuelên Basmehana Izmîrê. Lê tevgera wî ne a homoseksuelan bû;

82

mîna generalekî bi disîplîn tevdigeriya û liblibî dipeyivî. Jîr jî bû. Têra xwe ”marksîzm û leninîzim” dizanîbû. Xwe mêrsînî nîşan dida, lê Adapazarî bû. Di nav xelkê de ”dêya min laz û bavê min kurd e”, digot û kêfa xwe bi dê û bavê xwe ducelebî re dianî. Ew jî ne wilo bû. Dê û bavê wî herdu jî tirk bûn. Her tim mirêkeke destan pê re bû. Belkî jî ji ber ku hejêkirina xwe şanî Reyis bida, ev mirêk bi xwe re digerand. Sûretê Reyis bi pişta mirêkê ve zeliqandibû.

Kenên piştî ku dest û lingên Hemo bi qetik girêdan, pê li sênga wî kir û dengê xwe hilda û hilda:

”Tu ajanê polîsan, yan jî wek Serdêr, ê yuzbaşiyê
tabûra Nisêbînê yî?”
”Ez ne ajan im.”
Kenên ji Mûso re:
”Bi gunên wî bigire û babide”, got û awira xwe berda
ser gunên lêwik.
Wî wilo kir.
Liberxwedana Hemo deqîqeyek ne girt. Xwe him kir
ajanê polîsan û him jî ê yuzbaşî. Di vê bêhnikê de Hemo
ji cewrikekî bêhtir dikir kûze kûz , heger Kenên xwestibya,
ji sedî sed wê wî xwe kiribaya serekê ajanên Tirkiyê
û heta belkî ê CÎAyê bi xwe jî. Lawik bi carekê ve ji
desthilanîn ketibû û habela xwe diavêt tor û bextê wan.
Lêwik xwe kiribû ajan, dest û lingên wan ha ha maçî dikir
û dîsa jî fêde ne kiribû.
Kenên piştî ku ji hevalên xwe re got ”cezê mirovê ajan
çî ye?” û hevalên wî hemiyan jî bi hev re gotin ”kuştine”,
meqesek ji ber rextê keleşkofa xwe kişand û da destê
Mûso.
Meqes bi qasî qelemeke hibrînî dirêj dihat. Meqes
83
kevin xuya dikir. Qulikên doxikê mihyayî bûn. Serik jî
hinekî kelpitî bû.
”Serê wî hişk zeft bikin!”
Wan wilo kir.
”Memika guhê wî ê rastê jê bike!”
Mûso bi haweyê ku ricfa destê xwe ji hevalên xwe
veşêre, ji nişkê ve meqes avêt bin çengê xwe û bin çeng

xurand. Dû re jî bi hêrs meqes avêt guhê wî û hinek kerik jî bi memikê re revand. Hemo dikir hewar hewar. Hevalê wî jî li dera han wek pepûkê serê şikêran, rûniştî xwe dabû ser hev û qîq sekinîbû.

”Heta bi hestî, bêvila wî jî jê bike!”

Mûso bêyî ku bi bêvila wî bigire, bêvil ji jêr ve da ber devê meqesê. Ev yeka han ne ji ber jîrekiyeke wî filan bû, ewqasî dizanîbû. Lê heta ku çimê serê bêvilê jê kir, meqesê xwe jî sê carî di birînê de bir û anî. Barîniya gayekî ji Hemo dihat!

Dema ku ew li ser pişta Reşît dişidandin û ji serê wî ê xilyayî xwîn bi nav bihara Zorava de diherikî, Hemo hîn jî li ser hişê xwe bû.

4

Seet duduyê rojê bû. Xortekî bejintîtalî li odeya Heso di nav koma zilaman de rûniştibû û şêwir û mişêwra kuştinê digerand. Mil û zendên vî terlanê xortan, lihevhatî bûn. Sênga wî hinekî bel bû. Stuyê wî ê dirêj di bin porê wî ê tarî de, weke şevên zivistanan ku di banga sibehê de dinya diçirisandin, xuya dikir. Bêvila wî bi ser a omeriyan de çûbû; piçekî qulingî bû. Çavên wî ên şîn û mezin tam li ên

84

pêşiyên bûblaniyan hatibû. Mirov digot qey lawê Gird Elî ye. Ruyê wî gewrekî bi ser esmeran de bû. Lê simbêlên wî ên qalind û komirî, wî bi carekê ve gewr didan dest. Çepil li qamê bûn. Tiliyên maşikî li ên dê çûbûn. Lêvên wî jî. Şana di gwîzeka qirikê de, wek heba tiriyê ku di zimanoka şaqûlê de, li ser dara şînokê teyrikan nikilandibû, şimamî

dixuya. Çena wî bi fesal bû. Mijankên wî ji ên Seyrê jî dirêjtir bûn. Serê wî bi qasî ê beranekî bû. Eniya wî li eniya serokên serhildanên kurdan çûbû, keverî bû. Diruvê maqûlan pê diket. Mîna wan jî dipeyivî. Ev Reşo bû.
Piştî Şoreş, bê dilî xwe li ser daxwaza Reyis hatibû gund. Reyis ew di şûna Şoreş de kiribû mezinê herêmê. Lê di eslê xwe de a wî ne mezinahî emirberî bû. Li gora talîmnameyên Reyis tevdigeriya. Her ji du-sê rojan diçû Nisêbînê û bi telefonê pê re dipeyivî. Hîn hevt rojên wî li gund ne qediyabûn, du şerên giran bi Serdêr re kiribûn. Lê di herdu şeran de jî Serdar jê bi serketîtir derketibû. Zilamên wî hindik hatibûn kuştin. Bi ser de jî Serdêr carekê êrîşî ser kozika wî kiribû û ew ji derb xistibû. Heger fîşeka Luqmên ruyê Serdêr şîş ne kiriba û Serdar gêj nebûya, Reşo di şerê pêşî de miheqeq dihat kuştin. Serdar bi wê kiryara xwe di nav gundiyan de bi qasî Restemê Zalê mezin bûbû. Nav û dengê wî li temamê herêmê belav bûbû. Ji ber wê mêrxasiya wî, Reyis jî ji Reşo pir hêrs bûbû û çar arpicî jê re şandibûn.
”Hevalino, li gora dîtina min, şerê di gund de wê ji ê li qelêç baştir be”, Proleter Mihê got û li çekdarên sereke nerî.
Dizanîbû ku çewt dibêje.
Çekdarên herdu partiyan piştî çar şerên ku di gund de
85
li dar xistibûn û di wan herçar şeran de jî agir bi hin malan ketibûn, di nav xwe de li hev kiribûn ku êdî wê di qelaçan de şer kiribana.

Rizgoyê şirnexî kurmanckî li bûyerê nerî:
”Şerm e heval! Ma ne me peymanek di nav xwe û cahşan de danîbû ku em ê li gund tu carî tivingê neteqînin.”
Tîmûrê xerpêtî îdeolojîk fikirî û got:
”Ji bo partiya me çawa baş be helbet em ê wisa bikin. Menfehetên wê di ser her tiştî re ne. Di ser her tiştî re ne dibêjim, ji ber ku heta bi Kurdistanê bi xwe bi partiyê heye.”
Mahmûdê adiyemanî:
”Hevalê Rizgo rast dibêje. Him peymanê li dera han bihêlin, ji bo zarok û pîrekan jî mabe gerek em di gund de şer nekin...”
Dengê erbaneya ku ji aliyê malê dihat, hinekî bala civatê dikişand.
Nedîmê sêwregî di bin tesîra erbaneyê de piştî ku got ”Reyis rast dibêje”, hema pê re bi xwe hisiya; dev li zimanê xwe kir, gotina xwe bi haweyê ”hevalê Tîmûr rast dibêje” serast kir û bi tirkî domand:
”Heval, bêyî xwendin û zanînê ji diyalektîk tarîxî mataryalîzmê dipeyive. Diyalektîk mataryalîzm ne bi tenê ‘ontolojîk’, di heman wextê de ‘epîstemolojîk’e jî. Di marksîzmê û leninîzmê de tiştekî neguhêz tuneye. Her tişt bi qasî xwe û bi haweyê xwe di liv û tevgerê de ye û bi hev re dikoşe. Ji ber vê yekê jî tiştek her tim nikare wek xwe bimîne. Marksîzm, heta mantiqekî wilo ye ku di tu qaliban de xwe bi sînor nake. Dazanîneke dualî pêşkêşî me dike.
86
Bi tenê li temamê fenomenên di hindurê prosesa derbasbûyî

de nanere, ji aliyê pêşerojê de îzaheta bê wê ew fenomen
çawa şikil bigirin jî dide me. Diyalektîk tarîxî mataryalîzma
Marks, bi haweyekî ilmî tevliheviya di heqîqeta
tiştan de, merheleya pêşketin û paşketina di 'mûtlaq' û
'îzafiyetê' de, têkiliyên di navbera guhertin û neguhertina
ruhberan de rave dike. Bi kurtî, yanî gotina doh bi hêsanî
îro dikare derbas nebe. Ev qanûneke diyalektîka Marks e.
Gerek em lênerîna heval Proleter Mihê di ber çavan re
derbas bikin", got û mîna berdûşên derdora sûra Diyarbekirê
ku li kerxaneyê, zewqa di pîrekê de nuh keşif kiribe,
li memikên Seyrê nerî.
Memikên vê xipşa zinaran jî, mîna du sêvên xelatî xwe
dabûn kirasê etlesî û kiras bi bejin û bala bilind re rakiribûn
qada cengê. Ruyê vê xezala ku di bin sîha van mêrkujan
de wek lempeya nîvê şevê pêketibû, eşq û sema dipijirand.
Gava ditewiya, biskên wê ên tarî bi ser dêman de
mîna xinceran dikişiyan. Bi tepsiyeke qedehên çayê ve
hatibû odeyê. Nedîm ne bi dilekî, bi duwazdeh dilan dil
ketibûyê. Lê hay û bayê Seyrê jî jê tune bû. Rojekê li xaniyê
malê, ew sêngvekirî dîtibû û qederekî bêdeng serxweçûyî
li erdê rûniştibû. Nedîm bala Reşo kişandibû. Piştî ku
Reşo li seeta xwe nerî, seet sisê û çarîkek bû, bi haweyê
ku giraniya şer hemî li ser milên xwe hîs bike, ji kûraya
kezebê hilmek kişand:
"Şewqedîn, ji dêvila xweha xwe ve çayê bigerîne!" bi
zirt got û dewam kir:
"Menfehetên partiyê çi dibin bila bibin, fîşekek bê çi
ye di gund de nayê teqandin..."

Dema ku Seyrê bi meşa qitikê ode diterikand, Nedîm jî
87
wek lemê ku mirov hêdî bi hêdî ji kokê bike û lem bi rehikên
xwe ên ziravik hîn jî xwe ji axê bernedabe, bi çavekî
xilyayî li bejin û bala wê qulinga zozanên Serhedê temaşe
dikir.
Zibêr xwest ku sêlê bisincirîne:
”Pêşiyên me jî dibêjin ‘tiştek wek xwe namîne.’ Gelo
ev Marks ne kurd be, lo?”
Yavûzê meletî ji mêrxasî û jîritiya Nedîm didexisand.
Di şerê sê roj berê de heger ne ji Nedîm ba, Yavûz jî wê
bihata kuştin. Nedîm, li ê ku li wan girêdabû, kuştibû.
Yavûz ne hişt ku civat bi gotina Zibêr bikene, çixareya
xwe bi lez pêxist û çi hat ber devê wî got:
”Lenîn di kitêba xwe a bi navê ‘Mataryalîzm û
Ampîrîokrîtîsîzmê’de, mataryalîzma frensî a qernê hevdehan
mehkûm dike. Locke bi teoriyên xwe ên sensualîst
temamê ronakbîran xistibû bin tesîra xwe. Bi rastî Lenîn û
Reyis derbeke mezin li Hobbes, Spînoza û Locke xist...”
Di eslê xwe de ev lawik ne wek niha wilo teriqîbû. Car
carê bi xwe difikirî; ewqasî ne girêdayê Reyis bû. Di sala
ku PKPKê di nav alîgirên xwe de def û zirne, tembûr û
ribab qedexe kiribû û alîgiran jî dest dirêjî erbaneyan kiribûn,
Yavûz bi haweyekî hişk li himberî wê yeka han derketibû
û heta ku ne hatibû Zorava jî ji ser a xwe ne hatibû
xwarê. Proleter Mihê xweş li erbaneyê dixist û xweş jî di
ber re digot û diavêt ser Reyis. Yavûz ketibû bin tesîra
erbaneya wî.

Reşo bi gotinên Yavûz hîn bêhtir aciz bû. Dîsa li seetê nerî, seet sisê û nîv bû. Qadir û Mûso hatibûn gund û li odeyê rûniştîbûn. Lê hîn jî behsa bûyera xwe a çend seet berê ne kiribûn. Reşo piştî ku destê xwe zer kir qutiya

88

bapîrê xwe û ji hevalên xwe re dîsa bi kurdî got:

”Sosyolojî di tarîxa mataryalîzmê de her tim bûye beşekî felsefeyê. Û Marks jî ev yeka han girîng dîtiye û li ser sekiniye. Têkiliyên sinifî tiştek in û kultura civakî tiştek e. Helbet her tişt kultur e lê ez tiştekî din dibêjim, hevalino. Min fêhm bikin. Belkî dibe ku mirov bi carekê ve bikaribe pê li temamê têkiliyan bike, lê çênabe ku mirov bi carekê ve pê li kultura miletekî bike. Kultur serweteke gelêrî ye. Têkbirina kultura civakî, karekî dûdirêj digire. Hinekî jî divê mirov bi exlaqî, ew jî carina, li hin meseleyan binere.”

Vê carê jî berê xwe da Nedîm û wek doktorê ku bi nexweşê xwe re bipeyive peyivî:

”Hevalo, fetişîzm bi têgehên felsefî bincil nabe. Tiştê ku di dilê te de derbas dibe, di ruyê te de xuya dike. Him jî tam bi haweyekî vekirî. Ji bîr neke ku di nav miletê me de, ruhberên metayî hîn jî milkî ne. Piçekî ji dilê xwe dûr bikeve. Ez dîsa dibêjim, em ê di gund de şer nekin heta ku ew bi me re şer dernexînin. Dema ku derxistin jî em ê wan bikişînin çiyê, ewqas.”

Dengê qide qida mirîşkan û erbana ku Xelîl lê dixist, bala çekdaran hîn bêhtir belav dikir. Civat diqeliqî. Ji êxur, mîna ku hemiyan di nav xwe de peyman danîbin, yekê bi

dû yekê de diqidqidand. Dengê mirîşkekê pir qalind dihat. Nedîm ji destê hizn û cemala ku Seyrê dabû hindurê odeyê hîn jî baş bi ser hişê xwe ve ne hatibû. Bi haweyê ku hirmeta xwe şanî Reşo bike, serê xwe berdabû ber xwe û li Seyrê difikirî. Heso jî li ser kulêv çarmêrkî riniştibû; bêbalîf pala xwe dabû dîwêr û mîna pûtekî grêkî ji kûr û dûr difikirî.

89

Dilê Reşo xuşûş girtibû. Berê xwe da Mûso û tene tene got:

”Kenan û hevalên din çima ne hatin? Ma ne divabû hûn hemû seet li duduyan li gund bana?”

Mûso hîn jî ji tesîra bûyera ku kiribû derneketibû. Ji tirsan pir westyayî xuya dikir. Bi qûndaxa keleşkofa xwe dilîst û li derdora xwe dinerî. Reşo pirsa xwe dubare kir, wî dîsa fêhm ne kir.

Qadir peyivî:

”Kenan em şandin gund û wekî din jî tiştek ji me re ne got.”

Dengê tenekeyê hat, guhên hemiyan miç bûn. Wan lêdana tenekeyê bi haweyê şahiyê fêhm kiribû. Dema ku çekdarên Reyis li erbaneyan dixistin, direqisîn û di ber re dûrik digotin, benda din jî ji qayişa wan re li tenekeyan dixistin û distiran. Lê vê carê wilo ne bû. Bêhnek ne ket wê navê û her der bi dengê devziravan hejiya!

Heso xwe ne girt, beşirî û got:

”De here ha, bi telaq Maqsê wan qûn li Maqsê we qetand!”

Mêrxasên civatê li bendî emirê ku wê Reşo dabaya ne
sekinîn; wek berê tivingê di derî û taqeyan re firiyan
hewşê û li derûdorê belav bûn. Sadiq û Qadir berî her kesî
derketibûn û ji ber dîwarê hewşê li qesra Circîs girêdabûn.
Mîna ku tu xwê biavêjî nav agirê pizotan, bi ser mala Heso
de çaralî gule dibariyan. Nobedarê li ser odeyê bi gulê pêşî
re ketibû erdê û dikir hewar hewar! Nedîm pê ve çû. Reşo
ji ber deriyê malê bang kir:
”Na na, dev jê berde!...”
Hîn gotina wî di devê wî de bû, ji kêleka Nedîm a rastê
90
xwîn herikî û bêserî ji neqeban de hat xwarê. Reşo keleşkofa
xwe danî wê navê û pê ve beziya. Ew kir ber sênga
xwe û hêdî hêdî anî hindurê malê. Nedîm bêlept sêkinîbû,
lê hinekî diniriya. Ji ser hişê xwe jî ne ketibû. Meyroyê
balîf xist bin serê wî, li ber rûnişt û wek baranê hêsir gindirandin.
Reşo bi lez tentîryot anî. Pembo di tentiryotê
dakir, da dest Seyrê ku di birîna wî bide û dîsa xwe avêt
hewşê. Lê Nedîm miribû.
”Xwe ji hewşê berdin û bi qelêç de birevin, birevin!”
Reşo got û ber bi Sêdiq de bazda.
Qadir bi qahr peyivî:
”Ma tu nabînî ku rê nadin me! Ma em ê çawa xwe ji
gund berdin!”
Reşo bi haweyê ku ji her kesî re bibêje:
”Ma ji çend aliyan de li me girêdane?”
Ji bilî ku ji nav gund berdidan wan, ji sê aliyan de jî li
wan girêdabûn. Ji bestê, ji nav rez û ji dimdimê rêya Dêrê

bêwestan gule dihatin. Reşo piştî ku arpiciyek li ser qesra Circîs kir û sê-çar saniyan ji qesrê deng biliya, ”çar çar li nav gund belav bibin!” got û bi keleşkofê ve berî hemiyan pekiya wê navê.
Qadir û Sêdiq jî dan ber. Reşo bi guleyê ku di nav şeqên wî re firiya, kumişî erdê. Pê re jî xwe çeng kir ber taldeya dîwêr. Heger ne ji dîwêr ba, av ne digiha ser. Çekdarên herdu partiyên ku xwe li mezinahiya miletê kurd girêdabûn, bi şerê gerîlayî di navtarên Zorava de hevdu birin û anîn û li ber hev veteqilîn. Guleyên ku ji devê G3 û keleşkofên sincirî difiriyan, mîna sersotan di dîwarên kevirî de agir vedidan. Dîwaran mîna malikên richayê kort kortî xuya dikirin. Li sikakan dîsa xort dina-
91
liyan. Kesekî newêrîbû xwe berda ser cendekên wan. Dîsa zarok behetîbûn û qîr û hewara dayikan bû. Li vî gundê ku tije ker bûn, kerek jî ne diziriya. Kevokan ji zû de borangehên xwe terikandibûn. Herçar kewên ku ji ser vî xanî difiriyan ser xaniyên din û bi qebe qeba dengê wan re kavilên Zorava mîna guharekî bi guhê herêmê ve dihejiya, bi çolê de terqiyabûn. Mîrzo ketibû taya wan. Ne dengê bilûra Cemşîtê ku keç û xortên dildar di borana evînê de difetisand û ne jî dengê ribaba Mîrzoyê ku heta bi zarokên di zikê dayikan de, bi hinera ribaba xwe re direqisandin, dihat. Gelek jinan bi stiranên wî ên evînî, zozo ber girtibûn. Û îro jî hêkên hesinî xwe berdabûn malzaroka wan. Çekdaran bang dikirin hev û ji hev re ”cahş” û ”ajan” digotin. Mîna guran xwe ji ber vê starê diavêtin ber stara

din û li hev direşandin. Pirên kûçikan ji gund reviyabûn. Ên mayî jî xwe di axuran de veşartibûn. Ji wan werê dîsa eskeran girtibûn ser gund. Dîkan di hindurê koxikan de serê xwe xistibûn bin baskên mirîşkan. Bi tenê zîxanan dixutxutandin. Ew jî di bin cîcerkan de. Ji herdu mêşdanên di gund de mêş ne difiriyan. Moz û mozqirçkan xwe dabûn ber qulên kewaran. Ji dengê ”ax” û ”eman!” û ”cahş” û ”ajan” û xurmîn û teqînê pê ve, dengê tiştekî ne dihat.

Di vê navê re jî usteymenê ser xeta mayinan, bi eskerên xwe ve hidûd zeft kiribû û ji ser girê Qesra bi dûrbînê li gund temaşe dikir. Terempêlên ku ji Nisêbînê ber bi Stilîlê de diçûn, li hindama Menderê disekinîn. Newêrîbûn derbas bûbûna. Qadir arpiciya duduyan jî berdabû qesra Circîs, lê herdu jî li qesrê ne xistibûn. Yek li sêncê û a din jî li kadînê ketibû. Dixan ji kadînê diçû. Heso û Circîsê ku

92

ji bav û kalan de hevdu kuştibûn û ji hev xwîn vedirşiyan, di qada vî şerê ”cahş” û ”ajan”an de xuya ne dikirin. Herdu jî di hindurên xwe de mîna hêlanê diçûn û dihatin û li aqilê dewletê û xwendekaran difikirîn. Qelebalixa pîrekan ji binya mala Cemşît dihat. Pîrekên herdu bendan jî li wir kom bûbûn. Dixwestin ku mîna salên berê dîsa hemiyan bi hev re çarikên xwe biavêtana ser zilaman. Dengê Perîxanê li ê hemiyan zêde dikir. Çekdaran berdabûn wan jî. Pîra Hilalê û jina Sebrî di xwînê de sor bûbûn. Ji zendê Redayê pir xwîn diherikî; her bêhnik dikarîbû bimira.

Reşo bi haweyê ku dijminên wî jî bibihîzin bê dixwaze
çi bike, bi dengekî bilind bang hevalên xwe kir:
”Hevalino pîrek tên kuştin, ev çi bênamûsî ye, ji ber
wan rabin! Dudu dudu hevdu bigirin û şer derxînin çiyê,
çiyê!...”
Bi gotina wî re ji aliyê din ve jî teqîn sekinî. Lê Proleter
Mihê dîsa bi a xwe kir û guleyek berda Perîxana ku li
wê navê bi neperûşkan bi ruyê xwe ketibû û habela digot:
”Hema lawo Reşo û Serdar, ez kî…ê we û mezinên we
di dêya hev kim! Bênamûsino, madem hûn ev mêr in, de
berê xwe bidin qereqolê ez we bibînim hi!...”
Keleşkofa Proleter Mihê zêde zêde sincirîbû; guleyê
ku ji hikmê nîşanê ketibû, êretî çûbû.
Herdu alî jî ji ber hev vekişiyan. Reşo û hevalên xwe
di bestê re û Serdar û hevalên xwe jî di pişta gund re bi
bazdan berê xwe dan qelêç. Herdu aliyan jî bîr ne biribûn
ku dane ser rêya çewt û bi vê şopê wê li hindama tahtikan
bigihana hev. Navbera kozikên ku li newala Kunhefvarê
çêkiribûn û tahtikan, hîn kîlometreyek hebû. Li vir li hev
93
teqandin û bi teqîn û teqîn hevdu ber bi goristanê de birin.
Serdêr sirt û berpalên qelêç, Reşo jî best û berqefên Qesrikê
zeft kiribûn. Goristan di neqeba wan de mabû. Serdêr
dîsa Reşo xapandibû. Di şerê tivingê de kê sirt û berpalên
çiyê zeft kiribana, ew bi ser diket. Îcar di destê wan de tew
ne tiving, G3 û keleşkof jî hebûn. Heger armanca Serdêr
ne bi saxî girtina Reşo baya, dikarîbû ew bikuşta. Reşo jî
mîna wî temamê kitêbên bi navê ”taktîkan” xwendibûn.

Him bapîrê wî Heso belkî pêncî carî jê re gotibû, ”binere lawê min, eman di newalan re ne bimeşe û ne jî razê!” Serdêr di cihê xwe ê raser de eman ne dida Reşo. Arpicî pê re tune bûn. Heger hebana, yek ji wan jî sax bernedida.
Bi dengê terempêla ku ji aliyê Stilîlê dihat, Serdêr teqîn sekinand û bi temamê hevalên xwe ve ber bi diyarê Sada de bazdan. Reşo cihê xwe berneda, lê ne teqand jî. Docek û cîbeke eskerî bû. Yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê ji gundê Herbê dihat. Çûbû li qereqola ku nuh hatibû çêkirin, temaşe kiribû. Yuzbaşî bi haweyê ku hîç tiştek ne qewimiye, li bayê beza xwe çû.

5

Perîxanê termê Bozên û Bedirxên di ber hev re dirêj kiribûn; dikir hewar hewar û porê xwe dikişand:
”Li min pepûkê Sarê, ez nizanim bê ez ê porê xwe bi ser kê de kur bikim! Yek lawê min, yek jî biraziyê min e. Porkurê Sarê, tu ê çawa debar bikî! Tu ê çawa bikaribî xwe li ber vê êşê bigirî!...”
Qîrên Perîxanê zingînî bi guhên Heso dixist. Lê hîç jî di eynê xwe de dernedixist. Mirov digot qey dilê wî qet-

94

ran pimpe dikir, ruyê wî reş xeriqî bû. Di odeya vingîvala de xwe li ser derzika piştê ramidandibû û li aqilê xwe û Sarê difikirî. Lempeya dilê wî vemirîbû. Jîna bê jin qet li hesabê wî ne hatibû. Heso wek simaqê li her tiştî dinerî. Di vê bêhnikê de Sarê ji xwe bi aqiltir didît. Helbet bawerî bi darê zorê ne dibû. Û Sarê jî ji ber wê yekê dev ji mala xwe berdabû. Baweriya sixte ruh sivik û silûk dikir û şexsiyeteke

pûç bi xwe re dianî. Mejiyekî bi sawêr, di cih de
dikarîbû poşmanî raber bida, xwe bicerisanda û car caran
jî serî hilda. Wilo bi serê Heso hatibû.
Meyroyê li aliyê malê hîn jî digiriya. Qey giriyê wê
têra du xortên çeleng ne kiribû; îcar zendên xwe jî bi
gezan terişandibûn. Temo gazî mela kiribû ku wan bişo û
di cih de bidefinîne. Lê ji ser rêya Menderê reşê mela bi
zor xuyanî dikir. Şewqedîn û Seydo di şer de bûn. Doguj
ji nêza dikir kûze kûz. Di kasika wî de av jî ne mabû. Hûto
xwe berdabû navtarê. Proleter Mihê bi hosteyî demaçê
berdabû gurçika çîmê xwe ê rastê û xwe di êxur de veşartibû.
Guleyê demaçeya simîtweso gurçik şîş kiribû. Pêjna
Zibêr ne dihat. Şer jî ne kiribû. Hesûk bi keleşkofê di nav
koma pîrekan de sekinîbû. Circîs tena kirês, barşewala û
xwas, bi haweyekî serxweçûyî ji vê navtarê bazdida navtara
din, bi herdu lepan li sênga xwe dixist û ax bi ser serê
xwe dadikir. Dixan hîn jî ji kadîna wî diçû. Mîrzo li ser
termê lawikê çolemêrgî sekinîbû û wek zarokên çardeh
mehî giriyekî bi qîje wîj dikir. Lawikê hevdeh salî mû ji
Mîroyê wî bernedabû.
Temo bi bêrê li hewşa xwe a zixurî li axê digeriya da
bi ser xwîna kuştiyan dakira. Dîkekî sor û şilûfekî bi
kumçik hilkişiyabûn ser dîwarê beragirka Sarê, berê xwe
95
dabûn aliyê malê û mîna ku terqîn dixwendin, bang didan.
Bala Heso kişandibû.
Kerîm bi lez xwe avêt hindur û bêhnçikyayî got:
”Apê Heso, xwîn li sikakên gund diherike, xwîn!...”

Heso bi qahr li qûn rûnişt û xwe daqûl kir. Di salên dawî de ji daqûlkirinê hez ne dikir. Gava xwe daqûl dikir miheqeq ya wê qirika wî hilata û yan jî wê bikuxuya. Piştî çend deng kuxuka hişk:
”Lawê kerê apê çi! Ji min re heval Heso bibêje!” got û gopalê xwe têwerkir.
Gopal lê ne ket. Heger lê ketiba belkî ewqasî ne tirsiyaba.
”Apo, apo, ev te aqilê xwe xwariye! Çi bi te hatiye!...”
Mîna ku mela bi niviştê devê Heso girêdabû û şêx jî bi bazbendê sêhr têk biribe, bi gotina wî re hewrên reş û tarî xwe ji ser mejiyê wî dan alî, rabû ser xwe û vê carê jî wek mîrekan peyivî:
”Lawê min, ma tu dizanî bê Circîs li ku derê yî?”
Di vê gavê de jî Circîs xwe radikişand Hesûk. Keleşkofa wî di nav destên wî de badida û gotinên çort pê re dikirin.
”Li navtarên gund tirabêlkê bi ser serê xwe dadike.”
Bi berzûrên Meyroyê kela girî ketibû qirika Heso. Di dawiyê de xwe ne girt û wî jî dest bi girî kir. Lê giriyê wî dişibiya giriyê jinên mîr û began; bêdeng hêsir dibarandin.
”Em bi haweyekî divê xwe bigihînin hev”, got û ruyê xwe ji hêsiran paqij kir.
Ji girî gotinên wî qurmiçî derdiketin.
Dîsa got:
”Ev wek kulî ne; kulî heta ku şînayê neqedînin xwe ji
96
ser şînayê nadin alî. Mexlûqekî ehmeq e, bîr nabe ku gava şînayî biqede, ew ê jî biqedin. Heger ez û Circîs em tiştekî di nav xwe de nekin, ev sêwlek wê kinêsa me vemirînin!...”

Kerîm wek kera ku mêşik bike, ji newqê û berjêr de
xwe li hev dizîvirand û bêtebat li wê navê diçû û dihat.
”Rast e, wek te ye apo. Gotinên te ji Quranê ne. Reşo
û Serdar herdu jî sosyal-faşîst in!”
Sala ku Heso û Hemo çûbûn Stilîlê gilî û li vegerê
Heso, bi Simo û Kenêr deremêt xistibûn bin xaniyê Circîs,
Kerîm jî berî bûyerê, di civatê de gotibû ”min di
xewna xwe de dît ku birûsk li xanyê Circîs diket...” Ew
xewna wî bûbû sebebê ku pîrek wî mirovekî ”nexalî”
bibînin. Lê piştî ku Seyitxanê zoravî xwe diberizîne
Kerîm û Kerîm jî nifirekê li lawê wî dike û dêya lawikê
hevt salî, dîsa seet li nehê şevê du hêkan di rûnê malê de
diqelîne, dide lêwik û wî dike xew û lawikê ku bi jehrî
ketiye, ne vedirşînin, ne aveke sar pê dadikin û ne jî wî
radikin doktor û dimire, temamê pîrekên herêmê Kerîm
mirovekî avzel dibînin û tên tewafa wî. Digel ku Kerîm
henekê xwe bi aqilê wan dikir, wan dîsa jî porê wî wek
niviştekê bi milên zarokên xwe vedikirin.
Rojekê di gundê Dêrê û Dala re xwe berdide Nisêbînê;
pîrek rêya wî dibirin û wî mîna rês di nav lepên xwe de
vediçirînin. Heger ne ji mirovekî dêrî ba, dibû ku pîrekan
ew biselixandana jî. Li gora ku ê dêrî digot, hema çend
deqîqeyekî dereng maba, wê pîrekan ‘îşê’ Kerîm biqedandana.
Wî şilfîtazî dikin û ji porê wî û heta ku digihê mûyên
tiliyên wî ên lingan, hildikin.
Telebeyan navê wî jî kiribûn ”Evlîya Kerîm!”
97
Heso guh nedayê, bê gopal di derî re derket û mîna

kewekî baskokirî bi nav gund de sûrikî. Heger wî wek niha bi vê taqeta li ser xwe bizanîbuya, miheqeq wê bi gopêl ne geriyaba.
Heso berê xwe dabû Circîs û wek ku difikirî jî ha ha dipeyivî. Him jî bi dengekî bilind. Xeberdana wî a bi deng, ew bi cesaret kiribû. Ax ku berê jî hema piçekî wek eva niha dengê xwe rakiribaya û ji aqilê xwe bipeyivya!
”Na na na, ne ez ‘ajan’ û ne jî Circîs ‘cahş’e. Ajan û cahş ew bi xwe ne! Dema ku min û Circîs me hev dikuşt, bi sedan esker dihatin gund û em bi lêdanê tirek dikirin! Tiştên nemayî di serê me de dikirin! Erê çima esker nayên gund? Çawîşê Stilîlê çima li me napirse? Ji bo çi şûba eskeriyê gazî van xortên ku wextê eskeriya wan derbas bûye, nake? Tiştek di vir de heye, tiştek! Lê ev tişt çî ye? Divê ez vî Kenêrî bibînim.
Erê kuro, hemû bûne derwêş û li erbanan dixînin! Reyisê wan şêx e ya, mirîd jê re lazim in; şêx û mirîdan xwîna me arast û her tiştê me temirandin!...”
Di asasê xwe de lêxistina erbaneyê ne ji bin Reyis derketibû. Erbane estrumentekî derwêşan bû û derwêşî jî ji zû de ji herêmê rabûbû. Xelkê, derwêş ji bîr kiribûn û xortan jî nizanîbûn bê erbane çî ye. Lê qedexa li ser tembûrê, ribab û def û zirneyê, xelk ajotibûn ku li hin aletên muzîkê guhdarî kiribana. Îcar piştî ku xelk dest diavêjin erbaneyan û di ber erbaneyan re jî hin alîgirên PKPKê dûrikan diavêjin ser Reyis û ew yeka han li hesabê Reyis jî tê, Reyis li Mêrdînê û li Rihayê dikanên erbaneyan vedike.
Heso li ber kidasa li navtarê sekinî; bi wahc hejek çilo

kişand û bi hej raperikî ser kidasê bû. Piştî ku tibabekî bi
98
hejikan re pevçinî, destê xwe avêt bêrîkan. Li çeqmêq
digeriya û çeqmaq jî ne li ser bû. Heger çeqmaq pê re
hebûya ji sedî sed, wê kidase bişewitanda. Di vê dema ku
bi dengê xwe ê herî bilind digot:
”Em ji wan bi aqiltir û mêrxastir in, lê çima ew bi me
dikarin? Wey li aqilê min û bavê min be, ma ne rê jî dabûn
ber me! Mêrikan digotin ‘tifaq û tifaq.’ Deh mirovên bi
tifaq dikarin bi deh hezar mirovên bêtifaq!’ Qeweta wan
ne ji jîr û zanatiya wan, ji tifaqa wan tê. Çi roja ku min bi
a vî Kenêrî ne kiriye ez li xisarê bûme”, pîrekan jî lê temaşe
dikir.
Di dawiyê de Perîxanê dev ji kuştiyan ber da û ber pê
de çû:
”Li min evdalê, Hesoyê me gewşe bûye! Ew jî dîn
kirin, çira mala bavê min tefiya, li min evdalê!...”
Hesoyê ku ji kînê reşxeriqî bû wek hirçekî birîndar
êrîşî ser kir:
”Srbavquza heram!” got û bi hej ew da ber hev.
Circîs jî ji binya darên tuyê li wan dinerî. Heso piştî ku
dev û ruyê Perîxanê di xwînê de hişt, bi bazdan xwe li Circîs
girt. Circîs ji ber wî qûna qûna bû; herdu destên xwe
bilind kirin û bi hêrs hejandin:
”Kuro lawo ma qey tu ê li min jî bidî! Weh, ev tu xurifî
yî, çi bi te hatiye!”
Heso dengê xwe bilindir kir, herdu destên xwe ber bi
ezmên de vekir û bi haweyê ku bi Xwedê re pevbiçine got:

”Rast e, em herdu jî xurifî ne. Ma ku em ne xurifî bana me dida dû van santorên ha, looo!”
Circîsê ku porê xwe di mezinahiyê de sipî kiribû, di cih de ji Heso fêhm kir ku dijminê wî lihevhatinê dixwaze.
99
Ew jî minêkar bû, lê li xwe danetanî ku gotina pêşî ji wî ba.
”Hema tu çawa dixwazî ez ê wek te bikim û hew!”
Kes li dora wan tune bû, lê her kesî jî li wan dinerî. Bi haweyê ku dengê wan neçe tu kesî, hevdu xewle kirin û bi lez dan ser rêya Qesra. Di rê de bîreke li dor bîst-sîh metreyekî kwîr hebû. Navbera bîrê û gund qey du sed metreyek digirt. şeş pîrejin ji nav koma pîrekan veqetiyan û bi dû wan ketin. Perîxanê jî di nav wan de bû. Lê heta ku pîrejin gihan çala Ehmed, Heso û Circîs bîra devvekirî derbas kiribûn jî.
6
Circîs û Heso heta ku gihan ser rêya Îpekê yek ji yekê pêxistin; ji dil û can li hev guhdarî kirin û bi telaqên jinberdanê sûnd xwarin ku ew ê heta bi mirinê bi hev re bin û tu carî xayintiyê bi hev re nekin. Herduyan jî xweş ji hev fêhm kiribû ku gava wan a xwe kiriba yek, li gund ew ê bûbana ên herî mezin û her tişt li gora destûr û rêbaza wan bimeşiya. Herduyan pir baş fêhm kiribûn ku heger destên xwe nedabana hev û li dijî telebeyan serî hilnedabana, wê kinêsa wan tefiyaba û mal û milkên wan av û av çûbaya. Li gora Kenêr ji xwe hîn ji serî de divabû eva han kiribana. Herduyan jî him aqilê telebeyan wek ên zarokan dîtibûn

û him jî dabûn dû aqilê telebeyan.
Circîs bi a Heso kir. Li Nisêbînê pêşî çûn ba Kenêr û pê şêwirîn. Li ser gotina wî dîlekçeyek nivîsandin û dan qeymeqêm. Di dîlekçeyê de xwestibûn ku mifrezeyek esker bê li gund bi cih bibe û bi esker re li himberî dijmi-
100
nên xwe ên telebe şer bikin. Lê piştî ku dîlekçeya wan bê bersiv ma, hersêyan hema berê xwe dan Cizîra Botan ba Sarê da cepheyê xwe qewîn bikin. Sarê a rojên giran bû û pêşeroja wan jî ji rojên giran li dev bû. Bêyî wê nikarîbûn tiştek kiribana. Bi rêya Cizîrê de wilo difikirîn û xwe li dergahê wê girtibûn.
Sarê gava ku herdu dijminên hev ên kevnare bi hev re dîtin, ji kêfan hew mabû bifiriya! Gotin nekir dudu, bi lez û bez xwe kar kir û ketin rê. Çûna wan a Cizîrê û vegera wan a Zorava qey hemû sê seetek kiribû.
Hersê xwêniyên zaroyên xwe, li Zorava li mala Dasim çong berdan erdê. Xaniyê Dasim li binya gund bû û li jêra wî jî tu xanî tune bûn. Li gora wan, xanî di cihekî stratejîk de bû. Pêşî bi xweşî çûn Dasim. Lê Dasim digel ku wek wan difikirî, xwe da erdê û xanî bi dest wan ve berneda. Circîs lê da tivingê. Dasim teslîm bû û bi ser de jî li ba wan rêz girt. Hîn du rojên wan ne qediyabû, Kerîm û Qaso jî bûn hevalên wan. Heso û Circîs bi Kerîm pişta xwe tam dan tahtê. Pîrekên ku Kerîm wek ewliyayekî didîtin bûbana hevalên kê, miheqeq wê wan qezenc bikira. Ew jî wilo difikirîn.
Circîs û Heso herduyan jî di xortaniya xwe de, bi tivinga

xwe derzî ji erdê hiltanîn. Du sekmanên di ser xwe re bûn. Di hikmê tivingê de tiştek ji ber wan xelas ne dibû. Çawa dixwestin, wilo jî lê dixistin. Çavên Circîs hîn jî heta bi reşê li ser girê Qesra ji hev difesilandin. Lê Heso bi zor odeya xwe û Hemo ji hev nas dikir. Reşo û Hesûk jî sekman bûn. Lê sekmaniya wan hîn xav bû. Circîs yekî wilo bû ku dikarîbû bi rojan raneketiba. Û gava ku radiket jî bi zor ew ji xew radikirin.

101

Van mirovan piştî ku bin zikê xênî qul kirin, di vê qulê re derbasî jor bûn û ji kelpîçan li ser xênî, li ser şeş qoran kozikek çêkirin. Reka kozikê jî hemû bi heriyê dagirtin. Pişt re jî, Circîs bi tivinga xwe a ingilîzî di kozikê de rûnişt û bi Reşo û Serdêr û zilamên wan re şer li dar xist. Wî bi devê tivingê û Heso jî bi şîretan li wan şidand.

Heso bang dikir û digot:

”Lawo Reşo, kalikê te bûye beraz, zû teslîm bibe! Kuro hûn nikarin bi me, ehmeq! Ez bûme Emerîka û Circîs jî bûye Rûsya. Pîrika te Sarê dibêje ku bila ew ê tirk bikuje, ez ê wî efû bikim. Di dêya xwe, tobe estexfîrullah, zû derbekê lêxîne û me hemiyan ji vî halî xelas bike. Kuro emirqesifiyo, hema vê carê bi a kalikê xwe bike, hi! Lawo wilehilezîm min pir tahb bi te re dîtiye, lo! Kuro heta bi bin te jî min paqij kiriye. Qewad lawê qewadan, tu ne li min, li Reyisê xwe çûyî...”

Sarê:

”Bêşeref lawê bêşerefan, ma mirov bêvil û guhên zarokên xelkê jê dike, kûçik lawê kûçik!...”

Kenêr:
”Gelî gundiyan, mezinên Reşo û Serdêr ji teref dewletê ve hatine xapandin, bi a wan nekin. Kurd û Kurdistan bi şêx û axan, mela û mitirban li ser lingan maye û partiya Reşo û Serdêr jî dijminahiyê bi wan re dikin. Dewlet li bendî ku em qira hev bînin sekiniye. Ji ber vê yekê têkilî me nabe. Xwedî erd hemû bên kuştin jî tu erd bi we nabe. Partiya Reşo li Hîlwanê û Sêwregê û a Serdêr jî li Batmanê xwedî erd tev de kuştin û dewletê jî erd kirin malê xezîneyê. Erd ne dan gundiyan. Hişê xwe bînin serê xwe. Binerin hûn ê dû re poşman bibin û naletê li xwe bînin ku
102
we daye dû zarokan...”
Kerîm:
”Birano, sosyal-faşîst û sosyal-emperyalîstên herî mezin Serdar û Reşo bi xwe ne. Heger ne sosyal-ajan bana, em bi hev ne didan kuştin! Heger bi rastî kurd bana, wê wan berî her kesî yekitî di nav xwe de pêk bianiyana. Derew bi me re kirin; dane dû mezinên xwe ên sosyalîşbîrlîkçî û em bi dostayî kirine nêçîra eskeran...”
Qaso:
”Ma kuro lawo, ne qaşo we ê şer bi Urûs û Emerîkayê re kiriba (!) Ma kî ji me bûye hevalê wan ku hûn me dikujin, weh! Cahş û ajanê mezin Kenan Arikan e, wî bikujin!...”
Hemiyan jî gurbûna şer bi Kenên ve girêdidan. Li gora wan Kenan zilamê dewletê bû û bi dostayî zarokên wan bi hev didan kuştin.
Circîs, Qaso, Kerîm û Dasim bi destpêka şer re, nobedar

ji ser xaniyan avêtin. Di hindurê seetekê de Circîs sê keleşkof di şer de fik kirin. Keleşkofa ku di destê Tîmûrê xerpêtî de bû, perçe kir. Di pencereya qesra xwe re berda zendê Serdêr, li gurçika zendê wî ê çepê xist. Serdar nema wêrîbû ji hindur derketaya. Di adin î rojê de destê Mûso nîşan girt û berdayê. Gule tiliya wî a girdekê revand. Berda Bekir û li bazinê lingê wî ê rastê xist. Bekir rakirin nexweşxaneya Diyarbekirê. Xecê li hesabê kurmanciya Heso çû û ji ser odeya wî bi dûrbînê li hêla Dêrê nerî. Circîs guleyek berda wê jî. Guleyê wî herdu tilmiqûnên wê şîş kirin. Sarê pir dixwest ku ew hatibaya kuştin, lê Circîs ji xwe fedî dikir. Dema ku Circîs nav di xwe dida û diteqand, ji aliyekî ve Sarê û Perîxanê û ji aliyekî ve jî ji nav

103

gund, pîrekan jê re dilîlandin. Circîs bûbû agirê dojehê, çar alî agir dipijiqand! Sarê du beran kiribûn setqe ku Kenan Arikan hatibaya kuştin. Lê Arikan jî bûbû kevirê binê bîrê, bi roj hîç ji hindur dernediket. Dabû dilê Circîs, li kuştina wî pir digeriya.

Reşo û Serdêr bi kalikên xwe re şer ne kirin. Lê kalikan jî ji dil bernedan wan. Li gund şerê herdu partiyan betal bû. Li qelêç jî dev ji hev berdan. Meyro û keça Circîs Şemsîxanê, rojê sê caran xwarin û vexwarin anîn mala Dasim. Gotin jî birin û anîn. Dilê gelek gundiyan ji pîremêran re dixwest. Heger Bozan û Bedirxan ne hatibana kuştin û bi kuştina wan re dijminahiya malbata hûr û pizûran nuh nebûya, wê herdu hêlan jî li ba pîremêran cih bigirtana û temamê çekdaran ji gund biqewirandana. Bi

sistbûna Reşo re, Serdêr hewl da ku koma xwe ji gund rake. Çekdaran nikarîbûn bi wan. Heger mêrxasî û pêhlewaniya Reşo û fenên Serdêr ên şer û pevçûnan bûba yek, belkî bikarîbûna bi kalikên xwe. Lê ew jî ku Kenêr ne bi kalikan re baya. Heta Kenêr tune ba, dîsa jî dibû ku pîremêr serketî derketibana. Ji ber ku gundî li pişta wan bûn. Zeman ji aliyekî ve bi ser çekdaran de vedirşiya û ji aliyekî ve jî bi melhema xwe birînên Heso û Circîs rehet dikir. Her roja ku derbas dibû, pîremêran neqebek herêmê zeft dikir û bêyî ku bizanibin bê çi dikin, neqeb di qada tarîxê de wek kemînê bi kar dianîn. Welatê xwe bernedidan û bi nav tirkan de ne diterqiyan. ”Koç û jibîrkirina zimên windabûn e!” Kenêr ji Heso re gotibû. Heso, ”bi kurdkujiyê mirov nabe kurd!” Circîs, ”dijminê me ê herî mezin bêtifaqiya me ye”, gotibû û heta bi kuştina lawên xwe jî di çav xwe rakiribûn. Sarê dev ji limêja xwe berdabû, bazarî bi

104

Heso û Circîs re kiribû û gotibû, ”çi dibe bila bibe, heger dinya xerab bibe û heta bi Xwedê jî ji ezmanan dakeve erdan, divê hûn ji ser a xwe neyên xwarê û wan santoreyan ji gund derxînin!” Li ser wê bazarê hatibû gund. Lê Heso û Circîs jî xayintî pê re ne kirin û tu carî jî ji ser a xwe ne hatin xwarê. Bi vê yekê herdu jî di çavên Sarê de bûbûn qeranên zemên.

Serhildana wan, di wextekî kurt de li herêmê deng veda. Hin maqûlên gundan ew ji xwe re nimûne girtin û serî hildan. Li Fafê Gepoyê etmankî û Kopoyê mahmûtkî, di qesra xwe de asê bûn û şer bi herdu partiyan re kirin. Di

vî şerî de piştî ku jina Gepo hat kuştin, birek gundiyan li
ba wan sef girt û di navtarên gund de şer sincirandin.
Herdu partiyan jî heta êvarê, bi zor xwe di kozik û çeperan
de girtin û bi reşaya şevê re filtî filtî reviyan. Li Talatê
jî wilo bû. Lê li Hildehê serhildana maqûlan hinekî bi
qolinc dest pê kiribû. Hamidê ku lawê wî mezinahî li çekdarên
PKPKê dikir ji teref lawê xwe hatibû kuştin...
7
Danê êvarê bû. Sura bayê esirê di guherên gund de li
hev dizîvirî û lemên bîstanan dialast. Hênkayê dabû
petêxan, tirozî cemidandibûn. Zebeşên alqoskî mîna
qeşîrê li ser zimanê zarokan dihiliyan.
Di vê bîstika ku gund tevdigeriya, Circîs jî li ser xênî
ketibû kozika xwe û êretî tiving berdidan. Heso bi Perîxanê
û Sarê re diwenisî. Dasim kerê xwe êm dikir. Kenêr ji
bo axurê zikberdayî ketibû heyra peydekirina kutekî û
stûnekê. Qaso raketîbû. Wê bi şev bisuhiriya. Kerîm dîsa
105
henekê xwe bi aqilê Reşo û Serdêr dikir. Jina Dasim xwe
bi ser teşta hevîr de xûz kiribû. Hevîrê wê tirş bûbû. Lê
nikarîbû nan pêveda. Ta girtibû. Zarokên wê li hewşê bi
bizineke kasaxî re dilîstin. Darik di nav parxwanên wê
radikirin. Bizin jî piştî ku du-sê gavan bazdida, xwe çitikî
li erdê dixist û di cih de diket. Zarok jî pê dikeniyan. Xort
û pîrekên gund ji ser xaniyên xwe bi Circîs re dipeyivîn.
Circîs ew li himberî mêran sor dikirin. Keç û xort ji pîrekan
bêhtir bi gotinên wî dikeniyan.
Hin xortan bangî Circîs dikirin:

”Çima Apê Heso dernakeve ser xênî? Dixwaze te bide kuştin û her tiştê te bi xwe bihêle, Apê Circîs.”
Ji bilî Arikan temamê çekdaran jî ji Heso hez dikir. Bi çavên festîwalê li Heso dinerîn. Li gora wan her tişt li ba peyde dibû. Gava ku xeberên çort didan, dîsa jî pê dikeniyan û ew hîn bêhtir li xeberan sor dikirin. Lê ew jî ne hindik bû, bi qasî şahirekî navdar xweş dizanîbû li hev bianiya û bigota.
Circîs di bersiva xortan de:
”Ma lawo, hey jina min xweha wî ye. Hema ez bêm kuştin jî bila ez bêm kuştin, jinik pê namîne. Him bimîne jî wê bi kêrî çi bê yanî. Min tiştek tê de ne hiştiye”, got û ji nişkê ve bi aliyê malê de qêriya:
”Heso, Heso, zû were vir!”
Heso bêhnçikyayî hat.
”Çî ye?”
”Min Kenano li ser xaniyê te dît. Ji xortan re xweş bike û car caran jî bi tirkî biavêje ber Kenên, binere bê ez wî nexim devê tivingê”, got û di nîşangehê re li ser xênî hûr bû.
106
Heso ji vir û wir da ser hev û belav kir:
”Lawo Reşo, ma ne te doza yekitiyê li me dikir, kuro! Lawê qûnekê, na na dêya te ne qûnek e, bavê te bênamûs e, ê em ji serî de yek bûn; we yekitiya me xerab kir. We da dû partiya ker û ehmeqan û we em jî kirin bergîl û hûn li me siwar hatin. Hûn bê hişim in. Ma mirov pê li urf û adetên bav û kalan dike, hey Xwedê emir qesifando! Lawê

kûçik, ma ji bo çi tu nafikirî bê çima eskeran destên xwe ji nav me kişandine?”
Rizgoyê şirnexî ji hewşa Zibêr bang kir:
”Apo, ma esker li himberî me çi ne, em ê devê wan biçirînin ku bên gund!”
Heso xwe ne girt:
”Oxlûm kes! Ûlen Arikan, mademkî erkektir, anasinî sîke...im çiq meydane!”
Bi vê gotinê re ji ser odeya wî arpiciyê agir pijiqand. Sarox di qormaxa xaniyê Dasim de belav bû. Qêrîn bi Xezalê ket. Pîjekî keviran li serê lawê wê ê çar salî ketibû. Lawik bêhiş li erdê veziliyabû û xwîn ji serê wî dihat. Perîxanê lawik xist ber sênga xwe û bi bazdan xwe berda ser rêya Menderê. Circîs dît. Dîn û har bû! Piştî ku nav di xwe da û got ”ez bavê xezebê me, ma ne ez ê yekî ji we li ser lingan nehêlim”, xwe di xênî werkir û di tabiya xwe de veket.
Tabî qederê deh gavekî ji xênî dûr bû. Ji tabiya wî xaniyên Heso bi carekê ve xuya dikirin. Di vê navê re jî Serdêr û hevalên xwe li xaniyê Heso û Proleter Mihê girêdabûn. Heger ne ji wî ba, dibû ku rewşa Circîs pir xerab bigeriya. Circîs û hevalên xwe ji ber ku ne li bendî bûyereke bi vî haweyî bûn, ewqasî jî xwe ji wan ne dihefizan-
107
din û di vî warî de haziriyeke bi rêk û pêk ne kiribûn. Ew jî hemû sûcê Heso bû. Heso bawerî bi Reşo anîbû ku wan çiqasî ji dil berdabana Reşo û hevalên wî, Reşo jî ji dil tu carî wê fîşekek bernedaba wan. Ewqasî berberî kiribû û

dîsa jî bîr ne biribû ku di pevçûna gundîtiyê de teqîneke bi
henekan, dîkarîbû bûba sebebê şerekî mezin û di vî şerî de
jî serê werîs ji destê şerkêşan derketiba. Ne şerê ordiyan
bû ku her tişt bi dengê pêpîkê û borîzanan bimeşiya. Ê
wan şerekî berîberdan bû.
Perîxanê hîn bi serê dimdim ne ketibû, Seyrê li texsiya
Seydo a reno siwar hat û texsiya reş wek mêr herikand.
Çarhawêr agir bi ser de dibariya; dikarîbû bihata kuştin.
Digel ku Reşo bikaranîna arpiciyê di gund de qedexe kiribû
jî, li ser emirê Arikan çekdaran du sarox jî avêtibûn
qesra Circîs. Saroxekê ji aliyê rohilat ve qorziya qesrê hilweşandibû.
Circîs bangî Serdêr kir:
”Lawê kerê, rê bidin min ku ez wî zeft bikim!”
Arikan xwe xistibû taldeya kîsên nikarê; car carê serê
xwe hildida û fîşekek-dudu berdidan. Circîs ew nas dikir.
Hema ku bêhnekê Serdêr ne teqandibaya, wê Circîs ew
têxista devê tivingê. Hemiyan jî nizanîbû şer bikirana. Di
destê Circîs de wek zarokan bûn. Di şerên dest bi dest de,
ji mêrkujan re zîrekî û sekmanî lazim bû. Û ev herdu tişt
jî li ba wan tune bûn. Her derê wan ji Circîs xuya dikir.
Sarê ji aliyê başûr ve xwe dabû ber dîwêr û her ji bêhnikekê
digot:
”Circîs, eman tu xortan nekujî, naşî ne!”
”Keçê bi wir de here! Tu bala min belav dikî! Bihêle
ku ez berdêmê, weh!”
108
Serdar li ser gotina Idrîs bêhnekê rawestiyabû. Arikan
ketibû zefta Circîs, lê Sarê ew xelas kiribû. Deqîqeyek ne

ket wê navê, Arikan bi qasî bihustekê dîsa serê xwe rakir. Circîs pê li lingê tivingê kir û di cih de jî ling berda. Lepta Arikan bi haweyê saniyan bû. Lê Circîs jî li gora mêrkujên sêwregiyan divabû lêxista. Di şerê tivingê de mêrê ku xete ne kiriba, zû bi zû ne dihat kuştin. Mêrê ku bi tivinga xwe bi kêrhatî bû, xeta herî piçûk di hindurê saniyê de bi kuştinê dawî lê dianî. Ji bo sekmanan saniye girîng bûn. Sekmanên sêwregî, wilo li meseleyê dinerîn.
Sarê dîsa peyivî:
”Circîso, ma ev tu nabê ji bo çi Reşo li we diteqîne? Ev lawik ne ewqasî bê nan û xwê bû lo, çi pê hatiye?”
”Keça kafirbavan, bihêle ku ez Kenanko bikujim! Mêrik dikeve zeftê, tu bala min belav dikî!”
Sarê devê xwe girt û hinekî jê dûr çong berdan erdê. Bêhnek ne ket wê navê, bi qurpîniya tivinga Circîs re, barîniya gayekî ji ser xaniyê Heso bilind bû. Gule qirika Arikan ji aliyê rastê ve şîş kiribû. Bi barîniya wî re ji sê niqteyan wek axê gule bi ser Circîs de bariyan. Serdêr jî bi haweyê ku ser kalikê xwe sivik bike, ji hevalên xwe re got:
”Heta cercûr biqede, hemû bi hev re û bêsekin li wan bireşînin!”
Wilo kirin û heta hinekan çend lib ji cercûrên duduyan jî teqandin.
Di vê bêhnika ku di hindurê saniyan de bi sedan gule ji devê çekên PKGKiyan derdiçûn, Zorava jî mîna kodika êş di nav toz û dixanê de dihejhijî. Camên gelek pacan ji dengê çekên wan şikestibûn.

109
Bîstikekê deng ji aliyê din biliya. Dû re wan jî teqand,
lê liblibî teqandin. Di wê navê re jî Reşo bi sê çekdarên
xwe ve li nav rez rûniştibûn û li şerê wan temaşe dikirin.
Ji Nisêbînê hatibûn.
Reşo bang hevalên xwe kir:
”Şer bisekinîn heta ku ez têkevim gund!”
Li ser gotina wî piştî bêhnekê hevalên wî nema teqandin.
Ên din jî rawestiyan. Ji xwe minêkar bûn. Reşo ket
pêşiya çekdaran; da ser xaçerêyekê û ber bi gund de beziya.
Ên pê re jî beziyan. Ew li kevirekî yeklepî likumî û
deverû çû erdê. Heger keleşkofa xwe ji destê xwe bardabûya,
miheqeq wê ne enîşka wî bizelhitiya û ne jî xwîn ji
bêvilê bihata. Bi ketina xwe ne fedî kir û ne jî sekinî; li
bayê bezê bi qutikê xwe bêvila xwe paqij kir.
Dema ku Reşo derbasî odeya kalikê xwe bû, Arikan
hinekî bi mitale û paldayî bû.
Reşo bi zirt jê re got:
”Ev şerê ku dîsa di gund de qewimiye, ji bin me yan ji
bin wan derketiye, hi?”
”Ji kalikê xwe bipirse, ezbenî”, Arikan got û xwe da ser
hev.
Wî û Reşo mîna du vagonên trênê ku bi hinc li hev
kevin, li hev dinerîn. Ode ji zilaman mirmirî bû. Ji bilî
çend kesan hemû jî bi vî şerê îro mahddayî bûn.
Reşo berê xwe da Sêdiq:
”Xalo, ma kes birîndar bûye yan hatiye kuştin?”
Sadiq bi keder lê nerî û bê dilî xwe peyivî:

”Ez çi zanim bavê mino, gerek tiştek bi kesî ne hatibe”, got û sekinî.
Piştî ku bêhnekê bêdengî kete nav hemiyan, Proleter
110
Mihê serê xwe ê zelût dorhawêr xurand, serê wî wek petêxê ku di nav beyaran de mezin bûbû, çewloxwarî bû, keleşkofa xwe hejand û bi hêrs çû ser Reşo:
”Heger wilo bimeşe em ê hemû jî bên kuştin! Ev bû du car ku ji xafil de li me direşînin...”
Vî mirovî gotina ku digot her tim nêvcî dihişt; nêvcîhiştin ji xwe re kiribû tebîhet. Xwest ku bibêje ”te dest û lingên me girêdaye”, Reşo qêriya. Dengê qêrîniya wî li odeyê veda:
”Wê keleşkofê deyne û biceheme!”
Belkî ev cara pêşî bû ku Reşo di civatê de qêriyabû û bi vî haweyî erza hevalbendekî xwe şikenandibû. Di civatê de mezin bûbû û terbiyeke civatî girtibû. Gotinên fahş qet li wî ruyê wî ê sipehî û sergiraniya wî ne diçû. Civat ji wê lepta wî hinekî sar bûbû.
Mihê bi hêdîka keleşkofa xwe danî wê navê û rabû ser xwe. Bêhna Reşo hîn daneketibû.
”Rext û demaçeyê jî!”
Mihê bêkip ode terikand. Di vê navê re jî mîna ku her kesî zimanê xwe daqurtandibû, deng ji tu kesî ne dihat.
Arikan piştî ku bi destmala li ser birîna xwe hinekî lîst, bi bêhnfirehî got:
”Ma Reyis tu not ne şandine?” û ji Seydo taseke av xwest.

Reşo nota ku Demoyê xelfetî li Nisêbînê gihandibû destên wî, hîn ne xwendibû. Not ji bo Arikan bû û Demo jî ji bîr kiribû ku jê re bibêje, ”ev nota heval Kenan e.”
”Na!”
”Çawa na yaho!”
Arikan cîgirê Reşo bû; lê li ba Reyis jî di partiyê de
111
zilamê duduyan bû. Ne Reşo û ne jî tu endamên komîta birêvebir bi vê yeka han zanîbûn. Di temtêla Arikan de du kesên din jî hebûn.
”Li gora prensîpên partiyê, ji bilî notên ku Reyis bi nav bike û bişîne, mezinên herêmê her notê dikarin bixwînin. Vê meselê bigire, ewqas!” Reşo got û dîsa peyv serguherî şer kir:
”Kê pêşî di gund de teqand?”
Luqman keniya:
”Kalikê te ê xurifî û hevalê te ê guhjêkir pêşî li hev teqandin û me jî da dû wan, bavikê mino...”
Reşo fêhm kir ku mesele dîsa ji Arikan derketiye. Awirek tûj tê firand û bi qahr rabû ser xwe. Piştî ku li nav solan hinekî sekinî, bi haweyê ku bêhntengiya wî derbasî kederê, keder jî bûbe kul û di kûraya dilê wî de rûniştibe, kire niçe niç û rast berê xwe da hindurê malê. Xelîl dîsa rahiştibû erbaneya Proleter Mihê û di ber erbaneyê re li ser Reyis dûrik digotin. Reşo bi erbaneya wî girt û bi hinc li erdê xist. Eyarê wê çiriya. Xelîl piştîkî ku derwêşkî li kekê xwe nerî, derwêşkî jî giriya û ji hindur derket. Meyroya ku li ser gotina Temo goşt li êgir kiribû û goşt tevdida, xwe

aciz kir:
”Birayê te dînikî ye, te erza wî şikenand, de here li ber bigere...”
Reşo deng ne bir xwe. Ji Nêrgizê hinekî dûr li ber paceyê rûnişt. Destê xwe avêt bêrîka şerwêl, lê not di bêrîka qutikê wî ê çepê de bû. Pir xwe tev neda. Dît û bi hosteyî not ji zemqê kir.
”Birêz Kenan, min nota te xwend. Bi rastî jî tu di nav
112
êgir de yî. Her tişt wek dilê te nameşe, ez pê diêşim û ez te fêhm dikim. Lê divê tu jî min fêhm bikî; mesele pir girîng e! Heger di van herpênc rojan de ne hate kuştin, îcar tu dikarî wî bihêrî.
Serketinê ji te re dixwazim, Reyis.
06 29 79”
Xwîn li Reşoyê ku heyranê Reyis bû vemirî û dinya li ber çavên wî reş xeriqî. Gêj bû. Xwe paş de vekişand û bi hemd pala xwe da dîwêr. Wî tu carî fikir ne kiribû ku di rojekê de Reyis wê ava serê wî jî germ bikira. Bi rastî ji aliyekî ve ji bo ku li ser vê yekê bifikiriya, ji xwe tu sebeb tune bûn. Ji serî de wek xulamekî wî tevgeriyabû û bi her tiştê xwe ve ketibû xizmeta wî. Wî jî li ser gotina Reyis mîna Şoreş, Zinar, Çiya û gelekên wek wan dev ji mal û milkê xwe berdabû. Dikarîbû bûba tirtireyekî ebûkatan; bi qasî hevalên xwe ên sereke jîr û zana û bi cesaret bû. Derew li bapîrê xwe kiribû ku zanîngehê dixwîne; bapîr her meh tibabek pere jê re dişandin û wî jî ew pere li Reyis û hevalbendan xerc dikirin.

Xwe birçî hiştibû; ji devê xwe kiribû û dabû hevalan.
Li sûkên Enqerê bi cilên pînekirî geriyabû. Rojekê Serdêr
ew li kolana Kizilayê dîtibû û çakêtê li ser xwe dabûyê.
Kêfa xwe bi wê raberdana wî anîbû û di ber xwe de gotibû,
”Serdar şoreşgerekî temam e lê çi fêde, di nav rêza
cahşan de cih girtiye.” Di eslê xwe de ew gotina han jî ne
a wî bû, Reyis wilo gotibû. Lê weke fala qereçiyê li hev
rast hatibû, di wê bêhnikê de divabû qenciya wî bi haweyekî
maqûlane bibersivanda.
Reşoyê ku xwe li ba Reyis mîna şêrekî zozanan dihe-
113
siband, niha jî xwe wek pisîkekî didît. Berî ku beşdarî nav
xebata kurdayetiya Reyis bûbû jî mêrxasekî di ser xwe re
bû. Li gora terbiya eşîra wî, mirovê dema ku li hidûd
bixista, di şikeft û qulan de raketibûya û bi şev li nav goristanan
rûniştibûya, mêrxasekî mezin bû. Û Reşo jî bi tena
serê xwe du caran li hidûd xistibû û li eskeran jî teqandibû.
Bi şev di nav goristana Pîr Kemêl de raketibû. Di çiyayên
Omeriya de şikeftek û qulek ne mabû ku ne ketibûyê.
Ev mirov bi cesaret bû. Digel ku vî mirovî ew cesareta
xwe a bê sînor ji qeweta Reyis ne stendibû, dîsa jî xwe ne
tiştek didît û ji tirsan mîna pelên çilo diricifî. Di hezaza
mejî de li xwe digeriya û digeriya. Di bêhnika ku hema
hema dikir bi ser xwe ve bihata, keda wî dihat bîrê û dilê
xwe bi xwe dişewitand. Bi qasî ku dilê xwe bi xwe dişewitand,
xwe ewqasî jî piçûk dixist û bi ser Reyis de digiriya.
Di kultura wî de pir şerm bû ku zilêm av ji bo
serşûştina jinê germ kiriba. Lêbelê wî li Qosarê av ji Reyis

û jina wî re germ kiribû û bi ser de jî kêfa xwe bi wê yeka han anîbû. Heta xwestibû ku serê Reyis jî bişo. Reyis kêfa xwe anîbû, lê jina wî qebûl ne kiribû. Wî jî wek temamê hevalên xwe pir dixwest ku Reyis hema jê re bigota, ”tu heyranê min î.” Heta bigota ”tu koleyê min î” jî, wê ji kêfan serxweş ketibûya. Zinar serxweş ketibû. Li ser gotina Reyis xeber bi dê û bavê xwe re kiribûn. Berizîbû Sarê. Niqutîbû dilê wî ku di rojekê de Reyis bianiya gund û xweha xwe Seyrê şanî wî bikira. Li aliyê din jî ji ber ku Hecî Serhanê nisêbînî, şêxên binxetî anîbûn mala xwe û keçên xwe pêşkêşî wan kiribû, qeşmeriyên xwe bi Hecî kiribûn. Ji şêxan re ”narsîst” û ji sofî û mirîdan re jî gotibû ”zir narsîst.” Seyid Hesenê eferî ”pîsikoz-narsîst” û

114

mirîdên wî jî ”pîskopat” dîtibûn.

Reyis gava ku fermana çekdarekî xwe bi têbiniyekê radigihand qesês, car carê xwe ji bîr dikir û digel navdêrê yan lêkerê re pronav jî dinivîsand. Di karê wî de belkî kêmaniya wî a herî mezin ev bû. Heger ”hêrandin” bi serê xwe ba, Reşo wê daqurtanda. Dibû ku wek Zinêr danequrtanda jî. Dema ku Zinêr li Sêwregê komutanî li çekdaran dikir, şepalê ku bi destê Demo bûbû ”hilm!” têbiniya ku wê bigihanda Alpaxû dabû destê Zinêr. Zênêr jî mereq kiribû û têbinî xwendibû. Di têbiniya wî de bi tenê ”Alpaxû, bihilîne!” hatibû nivîsandin. Lê Zinêr dîsa fêhm kiribû ku Reyis dixwaze bi Alpaxû wî bide kuştin. Zinar jî hema di cih de reviyabû û berê xwe dabû Rihayê. Li bajêr piştî ku gelek kes bi xwe hisandibûn, çûbû polîsxaneyê. Li gora

ku digotin, cendekê Zinêr di bin Pira Şehwelêtê de hatibû dîtin. Pir di navbera Wêranşehirê û Qosarê de bû. Lêbelê têbiniya Şoreş tam bi haweyê a Reşo bû, pronav li lêkerê siwar kiribû û gotibû ”wî bike pîşo!” Lê Şoreş dîsa jî fêhm ne kiribû. Yildirim, Şoreş li Batmanê di nav gidîşa genim de şewitandibû.

Reşo piştî ku qederekî paldayî ma, hêdî hêdî bi ser xwe ve hat û rabû ser xwe. Bîstikekê di cihê xwe de sekinî. Dû re bi lez dev û ruyê xwe şûşt û bi lez jî dîsa li cihê berê rûnişt. Rahişt keleşkofa xwe; saxtî kir û dû re jî cercûrên xwe hejmartin. Pênc cercûr li ser rextê wî bûn. Cercûr temam bûn. Li çep û rastê xwe nerî, demaçeya xwe a belçîkî jî dît. Demaçe hevtderbî û nuh bû. Bi qebza wê ve bi qasî nenûka tiliya navê mezin xelekeke zîv daliqyayî bû. Wî demaçe ji kîsikê paçikî kişand û pê li pişkoka cercûr kir. Fîşek ne kêm bûn. Bi hêdîka cercûr ajotê û fîşek

115

xist derbê; eminyeta wê ne kişand û demaçe kir cihê berê. Bi haweyê ku birepîne dijminê xwe tevlerizî û rabû. Lê mîna ku cin wî zeft bikin, hema pê re jî rûnişt û henûn henûn li dora xwe nerî. Nêrgizê bi tenê li hindur bû. Tibabekî çavên xwe ji ser danegerandin. Nêrgiza ku di hêwin de qehwe dikuta, lê hayî ne bû. Reşo ji nişkê ve keniya. Nêrgizê lê nerî. Di dawiyê de wê jî xwe ne girt. Lê kenê wê hinekî kubar bû.

”Erê erê, xebera kalikê min e, em ker û kûçik in!...”

Heso pir jê hez dikir. Rojekê soz jê stendibû ku wê jê re çîrokek bigota û ew ê jî jê nexeyidîba. Reşo soz dabûyê

û wî jî dest bi çîroka xwe kiribû:
”Di çaxê Harûn Reşît de, Seyid Hesenekî wek ê me, xwe li şêxitiyê diceribîne û di demeke kurt de jî bi ser dikeve. Şêx piştî ku bi hêz dibe, îcar çima xwe pêxember jî ilan nake!...
Bi kurtî rojekê Harûn Reşît gazî wî dike û li ser ku xwe pêxember ilan kiriye pê de dixeyide. Şêx, bi haweyekî Harûn Reşît qanih dike û wî tîne tekiya xwe. Mirîdan li hev dicivîne û ji wan re dibêje ‘Bizirin! Her kes dizire. ‘Bireyên!’ Her kes direyê. Û dû re jî berê xwe dide Harûn Reşît:
‘Ho padîşahê min, ez ne ji wan pêxemberên ku tu dibêjî; ez pêxemberê ker û kûçika me.’
Lawo Reşo, heyvanê zilamtiyê bi we re ne maye!”
Reşoyê ku qeşmeriyên xwe bi aqilê Heso û çîroka wî kiribû, di vê bêhnikê de jî bi bêaqiliya xwe dikeniya:
Di her tiştî de hidûdek heye. Û ji ber vê yekê jî gava ku li min teng dibe ez hinekî bi Xwedê bawer dikim. Madem kayinat çêkirineke, divê hidûdê wê jî hebe. Ya gelo ji ber
116
ku hidûdê têgihiştina min aqilê min derbas dike, ez wilo difikirim? Dibe. Erê ji bo çi min bêpîvan ji Reyis hez kir? Hidûdê hejêkirinê jî divê heba. Heye, lê ez beredayî me!
Di vî warî de psîkologan bi dehan kitêb nivîsandine. Û qaşo min hemû jî xwendine(!) Mirîd, gava ku xwe li himberî xwedayê xwe çendî piçûk bikira, xwe ewqasî jî mezin didît. Ez mirîd im. Heger vî mirîdî bizanîbûya ku Xwedê li ser piçûkkirina wî bilind û ew jî nizim dibe, wê xwe

ewqasî piçûk bikira gelo? Na. Ez piçûk im. Insan ruhberekî ku dikare biafirîne; ji ber ku difikire. Ez difikirim lê ez nikarim biafirînim, çima? Qey ji ber ku ez serbixwe nafikirim. Temam, ev rast e. Ez di bin tesîra Reyis de difikirim.
Ez ji xwe dûr ketime, ez bi nav ez im...
Meyroyê şîv hazir kiribû. Teşta girarê da dest Şewqedîn û got:
”Lawê min Reşo, civat li ser şîvê li bendî te sekiniye.”
Reşo bêyî ku lê binere bi herdu destan û sivik sivik:
”Yadê, dilê min naçe şîvê, bila şîva xwe bixwin”, got û ji cihê ku lê mabû dewam kir:
Li gora Hegel afrandêrê tarîxê Xwedê û li gora Feuerbach jî afrandêrê Xwedê tarîx bû. Tarîx bi mexlûqekî çênabe. Îcar insanê gava ku ji xwe dûr biketa, miheqeq xwedayekî wî jî divê heba. Ez ji xwe dûr ketime. Insan divê bêhn bike û tahm bike. Hejêkirin û dexs ji insên re lazim e. Û ev hemû jî bi fikara azad ve girêdayî ne. Qey ez sofî me? Na. Ji ber ku min ew ji xwe mezintir dîtiye min bi a wî kiriye, ewqas. Ev ne tu bersiv e. Ka ez li ku me, hi? Navê min Reşo, ê wî jî Reyis e. Ez bi navê xwe, tu bi navê xwe û ew bi navê xwe heye...
Vê carê jî Sadiq hat pey wî:
117
”Reşo, çênabe ku tu neyê şîvê, hin dikarin te engirî bibînin. Şîva xwe bixwe û dîsa were ji Seyid Hesenê xwe re têkeve silûkê.”
Di salên ku deng bi Seyid Hesenê eferî ketibû, Reşo hîn naşî bû. Seyid bûbû şêx, lê bê cibe digeriya. Şêx bi

xwendin û nivîsandinê nizanîbû. Di dest pêkê de mirîdên wî zilam û pîrek bûn. Piştî ku Seyid di herêmê de tam cî digire, îcar ji xêzika dînê mihemed derdikeve û wek wî nake; berdide zilaman û bi tenê pîrekan li dor xwe dihêle. Stilîliyan jê re digotin ”Şêxoquzo.” Di dawiyê de hingî ku Seyid dest dirêjî jinên mirîdên xwe dike, ji teref mirîdekî xwe tê kuştin.

Qesîdên wî wiha bûn:

”Bizinê za karik anî, mîhê za berxik anî
Kûçikê za cewrik anî, kerê za dahşik anî
Hespê za qantir anî, çêlekê za golik anî
Xwedê ji we re Mêhdî anî, hûn bûn helala vî canî
Hûn guh nedin mêrê xwe, werin ba Mêhdiyê xwe
Tev de xwe tazî bikin, sênga sipî jê’r vekin
Memikan serbest bikin, bihişta baqî heq bikin!...”

Qesîdeyek wî jî bi vî haweyî bû:

”Gayê bi rê do, bizirê di xurcikê do
Xeta di xetê do, Seyid di kozikê do...”

Dûrikên ku Proleter Mihê jî di ber erbanê re li ser

118

Reyis digotin, wilo bûn:

”Hayê hayê hayê, welat ketibû reşayê
Reyis rahişt çirayê, şewqê da me ji Rihayê...”

Zibêr û hin çekdaran ji vê dûrika Proleter Mihê pir hez dikirin:

”Reyis rabû ser çongê, tirko daye ber sêngê
Xwe çeng kir zengelorkê, xwîn herikandî cokê...”

Sêdiq jî navê Reyis kiribû ”Seyid Hesenê Rihayî.”

Henekê xwe bi aqilê Reşo dikir û car carê li ba wî dev diavêt Reyis. Lê henekên xalê li hesabê xwarzê jî dihatin; bi xalê xwe re dikeniya.
”Xalo hûn bixwin; ez bi Seyid Hesenê te daketime. Hema bêhneke din ez ê bêm”, got û nema peyivî.
Bi peyva wî re ruyê Sêdiq mîna gulekê vebû û di cih de fiskiland xwe.
Mirov çawa dikare bi van çend sîlehkên xwe, di vî qelaçkî de tetbîqatê bike? Esker çima têkilî me nabin? Ma qey bi rastî em ji wan xurtir in? Na. Em çima şer bi hev re dikin û hevdu dikujin, hi? Sebebê vê ne ez im. Naxwe kî ye? Belkî Reyis, belkî jî îdeolojiya min e. Kî dibe û çi dibe bila bibe, bi birakujiyê yekitî nabe û em hevdu dikujin. Ev ne baş e. Bi vî haweyî tu miletî serxwebûn bi dest ne xistiye. Gundî ji tirsan bûne hevalên me. Dîwarê tirsê zikdayî ye, her gav dikare bifeşkile. Em çima wilo dikin, tiştek di vir de heye, çî ye ev tişt? Qey bi rastî wek ku Arîstoteles digot ‘navenda fikarê dil e’, wilo ye gelo? Heger ne wilo
119
be jî, nîvê wê rast e; min bi a dilê xwe kiriye û daye dû Reyis. Lêbelê Reyis ne jin bû, Freûd derew kiriye. Na. Eşq her tim ne mê ye; dikare nêr jî bibe. Erê, erê. Lê eşqa min a welatî di şexsê Reyis de li hev geriyaye. Ji sedî sed wê ev rast be, ji ber ku ez xwe nas dikim; ez bi xwe dizanim bê ez çiqasî kurd im.
Destê xwe avêt bêvila xwe û serê bêvilê hinekî dewisand. Bêvila wî a tengijî werma xwe dabû der, dixuriya. Bi lez çixareyek xist nav lêvên xwe. Bitlîs dikişand. Dikarîbû

samsûn û marlboro jî bikişanda. Ji hingama ku bi Arikan re kiribû, çeqmaqê xwe li odeyê ji bîr kiribû.
Qêriya:
”Nêrgizê, Seyrê, Şewqedîn, Seydo, Xelîl, yadê, yabo ji min re êgir bînin!”
Meyro hema li ber wî bû û çaya piştî şîvê li êgir dikir.
”Lawê min ruyê te gewiriye, çavên te çûne xwar, tu ne rehet xuya dikî. Here ji der ve bêhnekê ji xwe re bistîne”, got û çixat da dest.
Sê darik di çixatê de hebûn. Darikek jê bê qûnik bû. Wî rahişt wî darikî. Tiliya wî şewitî, lê çixara xwe jî pêxist.
Erê çima heta ku Reyis min naxe devê tivingê ez bi sofitiya xwe şiyar nabim? Qey bi rastî ez narsîst im, ji ber vê yekê? Ez neheqiyê li xwe dikim: Narsîst pozbilind, bi paye, qure û pivikî ne; xwe di ser her kesî re dibînin. Ez tu kesî wek heywên û tiştin din nabînim. Insan her tim li ba min insan e. Hi i, min kêm got, ez xwe dixapînim, ev bi tenê çimekî meseleyê bû. Xulamtî, pesinvedan, bixwenebawerî û herwekî din, ev jî narsîzm e. Niha ez heyranê vî zilamî bûm yan na? Erê ez heyranê wî bûm. Naxwe ez narsîst im. Ê ne ez ê kirasê xwe biçirînim!
120
Ji Heso, Circîs û Sarê ez kê hilbijêrim gelo? Dema ku min da dû Heso û wek wî hema li ser netîca bûyeran fikir kir û min got ‘li pişt her eskerekî ordiyek sekiniye’, ez ê wî çaxî jî nikaribim tu tiştî bikim. Baş e, ez ê çima bi a Circîs ne kim? Xwe ji dijminê xwe re deynim û bigihêm meqseda xwe. Ev hîç nabe, bêşexsiyetî ye!

Peyivî:
”Temam, Sarê mifte ye. Gava min bi cesaret da ser bûyeran, wê aqilê min derkeve pêş û zihniyeta Heso û Circîs jî alî min bikin”, got û hêl da xwe.
Dema ku Reşo berê xwe da odeyê, her kes hîn di ser şîvê de bû. Zibêr xwest ku ji ber rabe û wî di tenişta xwe de bide rûniştandin. ”Na na, ez xulamê te me apo, keysa xwe xweş bike”, got û li kêleka Seydo eskerkî çong berdan erdê.
Seydo ji ser sifreyê rabû. Fedî dikir ku bi kekê xwe re xwarin bixwara. Rebenekî Xwedê bû. Di salên derbasbûyî de gava ku Reşo carina lê dixist, Heso jî xwe aciz dikir û digot:
”Lawo Reşo, ma ev belengazê han ê lêxistinêye kuro! Mirov wî di ser jina xwe de bibîne jî divê mirov pê re deng neke!...”
Reşo, li Mersînê ew carekê bi xwe re biribû kerxaneyê û ew dabû destê jineke şatir û çikçikî. Lê digel ku jinikê ew tev li şerwêl jî qebûl kiribû, Seydo dîsa jî jê vekişiyabû, ”Bacim birak beni” gotibû û ji nav destên ”Bacî” bazdabû. Seydo berî ku bibe PKPKî, PMKî bû. Lê di eslê xwe de ew her tim hevalê her kesî bû. Reşo ew bi darê zorê kiribû hevalê xwe. Jê re gotibû ”ez ê nehêlim tu xwarinê
121
bixwî heta ku tu nebî hevalê me.” Seydo jî bi carekê ve teslîm ne bûbû; heta danê nîvro li berxwe dabû. Bi ser de jî Reyis ew kiribû nûnerê xwe ê Dêrikê. Bi rastî jî dêrikî pê xenê bûbûn. Di dema wî de, li Dêrikê bûbû dewra

”Mêhdiyê axir zeman” û ”gur û mîh bi hev re diçêriyan!”
Lê belkî jî ji ber wê milayimtiya wî bû ku Reyis, ew ji wir surgonî Hîlwanê kiribû.
Li Hîlwanê dilê birêvebirekî Reyis pê şewitîbû û ew şandibû Qosarê. Li Qosarê jî şer hebû, lê ne bi qasî ê li Hîlwanê dijwar bû. Di rojeke ku Seydo û hevalekî xwe î dibistanê, hevalê wî PKGKî bû û Seydo jî pê dizanîbû, li sûka darfiroşan di pişt dar û beran de bi hev re diwenisin, PKGKî dor wan zeft dikin û wî hêsîr digirin. Şensê wî hebû ku di wan rojan de jî Serdar li wir bû. Piştî ku Serdêr ew azad kiribû, ji hevalên xwe re jî gotibû, ”ev mirov we bikuje jî eman hûn pê re deng nekin, ha!”
Li gora gotina Serdêr, gava ku wî mehkeme dikin, ew xwe aciz dike û xeberekê ji Salihê hevalê xwe re dide:
”Ehmeq, ma mirov xayintiyê bi destbirakê xwe re dike!”
Xeberên wî hemû wilo bûn. Gava ku pir û pir aciz dibû, ”heram” jî bi ”ehmeq” ve girêdida.
Di mehkemekirina wî de Serdar heq dabûyê û pê şêwirîbû:
”Ji ber vê bêbextiya ku bi te re hatiye kirin, em cezeyekî çawa bidin Saliho?”
”Bila rojekê xwarinê nexwe.”
Lê kêlikek ne ketibû wê navê, Seydo li gotina xwe poşman bûbû:
”Na na guneh e, taştê bidênê lê firavînê nedênê.”
122
Dema ku Reşo li Nisêbînê bê pere dima û diçû qehwexaneyê, Seydo jî bi xwe re dibir. Piştî ku çaya xwe vedixwar

û karê xwe didît, îcar ew li wir rehîn dihişt û derdiket.
Lê jî venedigeriya. Dîsa carekê Reşo ew bi tena serê wî,
seet ji yazdehên rojê heta şeşê êvarê, li qehweyê hiştibû.
Di dawiyê de çayger di heqê çaya xwe de bihurîbû û berdabûyê.
Arikan berî her kesî ji ser şîvê vekişiyabû û çixareya
xwe jî pêxistibû. Civat di ber xwe de ji vir û wir dipeyivî.
Dengê reqîniya kefçiyan dengê wan ê nizim, nizimtir
dikir. Ê li vî seriyê sifrê ji ê li wî seriyê sifrê fêhm ne dikir.
Mirovên ku di navê de rûniştîbûn, belkî jî ji ber tengaya
cih bû ku ewqasî ne dipeyivîn. Destmal li ser milê Şewqedîn
bû û li ber destên wan diçû û dihat. Bêhna xwêhdana
wan, hilma şîvê fetisandibû. Yekî bêhnokî gava ku ji der
ve de bihata, wê nizanîba ku şîva wan goşt û girar e. Hindur
bi qasî ku luks pêxistana, hîn tarî ne bûbû.
Ji bo xayinekî gotina herî sivik ku ê li himberî xwe bi
xayintiyê, ji bo qewadekî ku ê li himberî xwe bi qewadiyê
û ji bo qehbikekê jî ku a li himberî xwe bi qehbitiyê
tawanbar bikira. Arikan di vê çarçoveyê de bi Reşo re peyivî:
”Reşo, tiştên ku tu dikî ji ên ku partî dike pir dûr in.
Bêyî ku ji dilê mirov bê, tu bi zorê şika mirov dikişînî ser
xwe.”
”Çawa yanî?”
Gava ku Heso dihat bîra Reşo, di wê gavê de jî kê çi
gotina xerab jê re bigota, wî di eynê xwe dernedixist.
Bêhna xwe fireh dikir û bi nermî dipeyivî. Li gora Heso,
bêhnfirêhiya herî baş di dema herî teng de bû. Heger di wê
123
gava ku di civatê de dijminê te xwîn vedirşiya û te jî bi

zimanê xwe hingiv binisilanda, tu neheq jî ba civat wê hevalê te ba. Reşo fêda vê gotinê di santrala Nisêbînê de dîtibû. Ketibû gerîneka avê û tam di wê kêlîka ku ew ê bixeniqiya, gotina bapîrê wî hatibû bîrê. Ne ketibû kelecanê û di wê bêhnikê de tiştê ku wê bikira fikirîbû. Helbet di ava goleke sekînî de ba jî, gava ku lingê mirov hema li darikekî biketa û te ev darik wek marmasiyekî an mexlûqekî din li ber çavên xwe mezin kiriba, tu ê ji desthilanîn biketa û bifetisiya. Di binê gerînekê de jî av ne digeriya û mirov serdestî avê dibû. Reşo xwe berdabû binê gerînekê û bin av û bin av xelas bûbû.

”Mesele, tu nahêlî em şer bikin; te dest û lingên me girêdane. Digel ku em ji cahşan xurtir in, em pir li dawî ne.”

”Birayê min Kenan, ma gelo pêşmergeyên Berzanî cahş bûn ku heta gundiyên me jî cahş bin?”

”Ew tiştekî din e. Lê ma tu jî Berzanî yî ku tu erza endamên partiyê, di nav civatê de dişikînî?” Hinekî dengê xwe bilindtir kir, ”tu bi kîjan cesaretê dikarî tekoşerekî wek Proleter Mihê ji sîlehan bikî, hi?”

Reşoyê ku di vê bîstikê de mîna keftarekî bêhna xwe fireh kiribû, çixareyek pêxist. Li dixana çixareya xwe nerî û peyivî:

”Berzanî kurdperwerekî mezin û ewqasî jî mêrxas bû. Lê mixabin ew anîn lîstikê. Proleter Mihê ji malê ye. Yanî bi nanê Heso mezin bûye. Him sîlehê ku li ser, ne ê partiyê, ê malbatê bi xwe ye.”

”Ev çi gotin e! Ne bi tenê sîleh, her tişt malê Kurdistanê

ye û malê Kurdistanê jî ê partiyê ye.”
124
Remoyê qesirî rê li peyva wî birî û bi haweyê ku gihane dawiya şer:
”Weh, ev çi bazar e bavikê mino, malê Kurdistanê ye çima. Min li dor salekê li Stenbolê wek keran karê vî û wî kir heta ku min ew keleşkofka xwe kirî. We dest daniye ser keleşkofa min û hûn niha jî dibêjin, malê Kurdistanê ye. Bê çi bazara we xweş e wileh, lo!” got û li Reşo nerî. Arikan guh nedayê. Dizanîbû ku wî cidî bigire, wê yekî din ji wî mezintir bipeyiviya. Ên di temtêla wî de gelek hebûn. Devê xwe dagirt û berê xwe da Reşo, lê Xelef zûtir pê ve danî. Kevçiyê xwe avêt, kevçî ket ber Selîm, wî ne dît.
”We demaçeka lawikê min jî jê stendiye, demaçeka me jî bidin...”
Reşo ji dil keniya. Arikan ev haweyê wî ferq kir û dîsa bi hêrs got:
”Provakator wê tu carî nikaribin partiya ku bi xwîn û xwêhdana gelê me kurdan ava bûye, têk bibin...”
Reşo piştî ku sivik sivik got ”hop hop, bise bise, tu çi dibêjî!” berê xwe da Şewqedîn, ”ji nav lingên me vê xwarinê zûka rakin!”
Bi tenê Zibêr li ser sifreyê mabû. Wî jî dev jê berda.
”Terbiya min rê nade ku ez di mala xwe de, bikaribim gotineke çort bi te re bikim. Îcar hema aniha her kes bila xwe bide ser hev û em ê herin nav rez. Li wir çend gotinên min bi te û partiya te re hene û hew! Ha, wan çekan jî

deyne!”
Arikan mîna meşka ku mirov bayê wê bifisîne, di cih
de xwe ji çekan kir û pê re jî got:
”Hevalê Reşo, ev îcar partiya min û te çî ye? Partî a me
125
hemiyan e. Tu dixwazî çi bikî ji min, hi?”
”Devê xwe bigire û min çi got wê bike, ewqas!”
Partiya Reyis zêde zêde eskerî bû. Gava ku komutanan
radihiştin hev, eskeran jî ya wê serê xwe berdana ber xwe
û li wan guhdarî bikirana û yan jî wê wir biterikandana. Di
devjenga Reşo û Arikan de çekdar ne peyivîbûn. Lê dilê
hemiyan jî ji Reşo re xwestibû. Heta bi dilê Xecê jî.
8
Piştî devjengê bi deh-pazdeh deqîqeyan, Reşo hemû
dan dû xwe û li pişta bena rez komikî rûniştin. Mexrib bû,
lê hîn jî reşayî ne ketibû erdê. Ji wîze wîza çûk û teyrikên
ku li ser darên behîvan dilûsiyan, xuya dikir ku bîstikeke
din wê di şûna ronahiyê de reşayê girtibaya dinyayê. Ji
koma pizûriyan bêhtir çekdaran û ji çekdaran jî bêhtir Arikan
mereq dikir ku wê Reşo ji wan re çi bigota. Mîna ku
hemiyan zimanê xwe daqurtandibû, bêdeng sekinîbûn û
ziq li devê amirhêzê xwe temaşe dikirin. Ji wan hema bi
wê de marekî reş di ser tahtê re hêdî bi hêdî bi vir de û wir
de diherikî. Hemo berî Simo û Seydo mar dîtibû, lê bawer
kiribûn ku mar wê bi aliyê komê de ne hatiba, dengê xwe
ne kirin. Çar texsiyên ku li hindama Qesrikê sekinîbûn,
digel ku ji çekdaran dihatin naskirin, dîsa jî pir bala wan
kişandibû. Texsî ên pizûriyan bûn.

”Endametiya min a partiyê li vir qediya. Êdî ez û partiyê em nema tiştekî hev in. Ez ê ne dostê wê û ne jî dijminê wê bim. Ne partiyek bi şexsekî û ne jî miletek bi partiyekê azad dibe...”

Heta bi vir jî dilê çekdaran jê re xwestibû. Lê piştî ku

126

got:

”Reyis partî zeft kiriye û bi hin kesên cahil û xayin birêvebirên partiyê dide kuştin”, çekdar veciniqîn û Arikan jî paxav girt.

”Kekê Reşo, em dizanin ku Arikan heqaret li te kiriye, lê pir şerm e ku tu jî heqaretê li yekî wek Reyis dikî! Reyis bavê miletê kurd e, em hemû bi wî hene”, Qêdir got û serê xwe berda ber xwe.

”Reyis em weritandin hevalino, a wî heta bi serê cêr bû. Îcar îro jî lê digere bê wê çawa ji me xelas bibe...”

Arikan piştî niyeta wî fêhm kir û dît ku çi bibêje wê jê re bimîne, bi simbêlên xwe girt û got:

”Mirovên ajan wek te dikin. Lê wê ev ajantiya te jî ji te re nemîne.”

Reşo li ser pêyan sekinîbû; ber pê de meşiya. Çelq li komê ket. Sadiq pê ve rabû. Wî destê vî heliqand. Kevir di kaboka Xelef de rabû, wî bi kaboka xwe girt. Hemo destê xwe bire ser demaçeyê. Şewqedîn Mahmûd di nav çavên xwe rakir û bi dizî ew xist devê lûleyê. Selîm bi nîşangeha tivinga xwe lîst. Simoyê ku ji pisîkê jî pêhlewantir bû, diranên xwe sûtin. Kazim dîsa hêrs bû û keleşkofa ku di nav lepên wî de bû wek kodika bîçerê ricifî. Luqmên bi

simbêlê xwe girt û qûndaxa tivinga xwe bi erdê ve dewisand.
Meshûd demaçe ji qewlik kişand û hişk bi qevda wê
girt. Sîrêc keleşkof xist zikê çekdaran. Çekdar behetîn û li
derdora xwe nerîn. Seydo serê xwe bilind kir û çavên xwe
li ser hemiyan gerandin.
Bêhna mirinê difûriya. Di vê kêlîkê de bi lihevketina
du keviran re mesele diqediya; miheqeq bîst mêr li erdê
vediziliyan. Lê Reşo hîn jî li civatê hakim bû. Bi zirt got:
127
”Li cihê xwe rûne! Her kes li cihê xwe rûnin! Nepeyivin!”
Rûniştin û ne peyivîn.
Vê carê jî xwe bi ser Arikan de daqûl kir:
”Heger ne ji bo van xortan ba, min ê keleşkof bida
destê te û em ê ji hev re derketana ‘meydana kerxesînan.’
Lê...”
Tam di vê kêlîka ku Arikan ji tirsan bûbû wek lepekî,
ew zir marê berî niha di ber wan re derket û xwe li nav
koma wan qeliband. Pêl li hemiyan ket. Reşo fîşek ajot
derba keleşkofê, pê re jî bi dengê xwe ê herî bilind:
”Heçê rabe ser xwe, ez ê wî bikujim! Mahmûd tevnelebite!”
got û devê keleşkofê xist sênga wî.
Mahmûd rûnişt. Lê mar jî çûbû. Tev li Zibêr jî temamê
pizûriyan ji Reyis û çekdarên wî of bûbûn! Keft û lepta
Reşo pir li hesabê wan hatibû. Wî jî dizanîbû ku piştrast e.
Hindik mabû ku Temo dest û lingên lawê xwe maçî kiribana.
Sadiq ji kêfan re dikir bifiriya. Seydo jî li dera han
serê xwe berdabû ber xwe, darikê xwe di erdê de dibir û
dianî û bi aqilê Reşo dikeniya.

”Hevalino ez ji we hez dikim, ez naxwazim hûn tiştekî bêrê bikin. Ew çar texsiyên ku li ba Qesrikê we dîtin, xwe berdane newalê û li bendî we sekinîne. Hûn ku bixwazin şifêr jî wê we bibin wir. Bê vir de û wir de, ez naxwazim li tu kesî ji we guhdarî bikim, yek bi yek sîlehên xwe deynin ber xwe!”

Tîmûr rebenkî got:

”Heval, ma ez dikarim bibêjim ku sîleh ên partiyê ne?”

Dengê wî bi ser ên ordekan ve çûbû. Her gava ku dipeyivî, pirqînî bi Simo diket. Lê vê carê pê ne keniya.

128

”Dirêj neke! Ji arpiciyekê pê ve tu sîlehên partiyê li vî gundî tune ne û ez ê wê jî nedim!”

Reşoyê ku bi salan di nav hêza Reyis de têkoşabû, hevalên xwe ên ku di ser temamê malbatê re girtibûn, sisê sisê li sê texsiyan siwar kirin. Arikan bi tena xwe di texsiyekê de bû. Reşayê girtibû newala Pîr Kemêl. Bayê ku li pûşê bi goristanan ve dixist, hinekî sahw dida û bêhemdî xwe mirov dibire dinyayeke din. Gava ku di her texsiyê de du pizûriyên bi çek rûniştibûn û texsiyan berê xwe dabûn Qesra Qenco, Reşo jî digiriya û pala xwe dabû kêleke bi nav kirî.

129

BEŞÊ PÊNCAN

1

Ji her kesî bêhtir Sarê, Heso û Circîs bi reva Reşo kêfxweş bûn. Sarê û Kenêr reva wî wek mêrxasiyekê û ên din hemiyan jî wek tirsonekiyê dîtin. Heso û Circîs xwe nepixandin

û gotin:
”Lawê berazan xwestin ku şoreşê li me bikin, lê me devê wan çirand!...”
Kerîm jî bi haweyekî serxweçûyî ji Qaso re digot:
”Ê ne bi telaq, di ser qayişa sosyal-ajanan re, hema sibehê ez ê xwe berdim Mêrdînê, him araqê vexwim û him jî herim kerxanê...”
Reşo piştî ku Reyis bêminet kiribû û zilamên wî ji gund derxistibûn, nameyek jî ji Serdêr re nivîsandibû:
”Serdar, em hev nas dikin. Di şoreşgeriya te de tu şika min tuneye. Heta ez te ji xwe jî bêhtir şoreşgerekî kurd dibînim. Lê ez giham wê qenahetê ku sereketiya partiya min jî wek a te, ji rêya kurdayetiyê xericî ye û bûye piyonê dijminan. Ji ber ku meqseda ragihandina nameya min ne ve e, di vî warî de ez ê bi te re nekevim devjengê jî. Ez bi carekê ve ji partiya xwe veqetiyam û min hevalên xwe hemû şandin cihê ku jê hatibûn. Ji îro pê ve heta demeke dirêj ez ê neyêm gund. Lê bi wî şertê ku tu jî koma xwe ji ser gund rakî û tu nema têkilî gundiyan bibî. Heso û Circîsê ku me lawên wan kuştibû, ji me pir pir bi aqiltir in!...
Bi silavên şoreşgerî, Reşo”
130
Li gora Serdêr tarîxê rev qebûl ne dikir û tarîxa ku Reşo jî pê rabûbû nêvcî mabû; serê xwe ji Reyis re danîbû û reviyabû. ”Gerek ew kuştiba”, Serdêr bi niçe niç digot. Serdêr piştî vê nameyê, ji aliyekî ve bi veqetina wî kêfxweş bû û ji aliyekî ve jî bi mebesta ku Reşo partiya wî

jî wek a xwe ‘piyon’ dîtibû, xwe aciz kir. Lê dîsa jî di heman şevê de, bêyî ku bi tu kesî bişêwire, hevalên xwe hemû dan ser hev û ji gund derketin.
Bi reva herdu partiyan re Heso û Circîs, temamê gundiyan dan ser hev û li hev anîn. Piştî vê lihevhatinê, li ser gotina Heso, Circîs her kes ji sîlehan kir û sîleh jî li xewlecihekî di bin erdê de veşartin.
Heso bi dû ku tifek di Proleter Mihê de werkir û erza wî şikenand û Mihê jî xwe avêt tor û bextê wî û destê wî maçî kir, di Mihê bihurî û dîsa bi çavên gundîtiyê lê nerî.
Sadiq çend şiqam avêtin Zibêr. Zibêr jî dengê xwe ne kir û bi xwe re hilanî.
Dema ku Mahmûdê adiyemanî demaçe berdabû Sînên, Erol jî ew yeka han bi xwe ne xweş anîbû û ji gund bar kiribû. Erol mala xwe dîsa anî gund. Sînan ji girtîgehê derketibû û birîna wî jî rehet bûbû.
Kazimê pizûrî bi milama ku jina wî serdestî lê kiribû, zimanê jina xwe bi bistê dax da.
Sîrêc zendekî jina xwe şikenand. Binê lingên wê jî bi daran teqand.
Birehîmê hûrî şûjin avêt çavê jina xwe; hindik mabû çavê wê bipelqijiya.
Keça Hemoyê ku bavê xwe bêminet kiribû û ji bo qasidiyekê bi tena serê xwe çûbû Qosarê cem Reyis, li ser
131
gotina Sarê, bi destê bavê xwe hat kuştin. Nav hatibû ser.
Heso li himber derket û ji Sarê bexişandina keçikê xwest.
Lê dîsa jî urf û adetên pîrê, destneda bexişandinê. Û Ezîza

bejinçinarî û porxelek, di banga sibehê de, li binya zinarê Mêşê bi du gulên demaçeya çardeh derbî re bê can li erdê vezilandin.
Çend keçên ku ji gund bazdabûn çiyê, hatin bexişandin.
Lê hemû jî bi pîremêran re zewicandin.
Li ser gotina Circîs, Remoyê hûrî du şev û du rojan xwarin neda lawê xwe şehabo. Sêdiq jî Eshedê xwe, rojekê li ser alifê kerê girêda. Lê Cibranê lawê wî gihabû Reyis.
Mela Salar ji bo têkçûna herdu partiyan, li dor sê seetan bê navbir bang da. Mela Ehmedê omerî jî hilkişiya ser qesra Hesenê Hecî û ji danê sibehê heta danê êvarê qesîde gotin.
Luqmên ji kabên golik û beranan tizbiyeke dirêj ji xwe re çêkir.
Li Sêwregê, Batmanê û herêma Mêrdînê, şoreşa ku axa û begên kurdan dabûn pişt xwe û bi axa û began re şer kiribû, bi temamî têk çûbû. Axa û begên têrmal li hev hatibûn; şêx û mela û esnafên bajaran jî dabûn dû xwe û li himberî herdu partiyan serî hildabûn. Li gora wan, serhildanê jîr û zanahî bi xwe re anîbû. Bi qasî ku serê xwe hildabûn û li ber xwe dabûn, ewqasî jî qencî û xerabiya herdu partiyan ji hev fesilandibûn; di xwariya wan de rastiya xwe, di xerabiya wan de qenciya xwe û di qelsiya wan de xurtiya xwe fêhm kiribûn. Heger bi wî haweyî li himberî eskeran jî serî hildana, ji sedî sed wê xwe tam nask kiribana û ji ber koletiya xwe fedî kiribana. Hin ji wan wilo difi-

kirîn. Liberxwedanê ew ber bi şexsiyeteke gelêrî de biribûn. ‘şoreşê’ mîna ku Kenêr digot, ”telebeyan bi me da zanîn bê em çiqasî bi hêz in”, hêza wan raxistibû ber çavan. Gundiyan bawerî bi xwe anîbûn ku di rojekê de wê bikarîbana li dijî dewletê jî rawestiyana.
Eskerên dewletê piştî têkçûna ”şoreşa telebeyan”, xwe dan pişt axayên herêma Sêwregê, Hîlwanê û Batmanê. Bi wê destekê, axayan jî li gundiyan şidandin. Hin gundiyan zêc û zarên xwe ji wan re berdan, xwe li çiyan girtin û bûn eşqiya. Hin bi nav tirkan de reviyan. Li Sêwregê eşîra bûcaqan û çekdarên PKPKê û li Batmanê jî dîsa çekdar û remiyan hevdu pir êşandibûn. Mihê bûcaqî du çekdar bi saxî avêtibûn patozê. Wan jî çavên Osmanê bûcaqî xerimandibûn û kîr û gunên wî jê kiribûn. Bareşê PKPKî dusê bombeyên gerîlayî li Batmanê di bin gora lawê axayê remî de bi cih kiribûn; bombe teqiyabûn û gelek remî hatibûn kuştin. Lê şerê ku PKGKê li Batmanê bi reşkotiyan re kiribû, bi kuştina du kesan dawî lê hatibû. Heger PKGKiyan li Nisêbînê neavêtana ser gundê Şanîşê, çend zarok û pîrekeke din jî ne kuştibana, belkî xelkê herêmê ew bi qasî ên din ”serserî” ne dîtibana.
Nisêbîna ku di wextekî de bi qasî hindurê tabûtekê teng bûbû, bi têkiliyên dewlemend û esnafên ku li bajêr vegeriyan, bi qasî mezinahiya dinyayê fireh bû. Sûkê bi fêkiyê Bûnisra û tiriyê Omeriya bêhna biharê fûrand.
Bajar bû wek bexçeyekî ku di çola Sehrayê de be û temamê teyr û tilûran xwe lê bigirin, ji her derê welêt mirov hatin û lê bi cih bûn. Zemanê ku mîna çemekî bi hêl û mêl

diherikî, pûş û pelax diavêt qiraxan û dar û ber bi xwe re dibirin; di bin stûnên bajarê Nisêbînê de gêr bû û bi
133
peşkên xwe ên zelal gemara bajêr paqij kir. Agirê ku di dilê xelkê de hil bûbû, di hêsirên çavan de tefiya. Her kes bêtirs û sahw çû ser mezel û gorên ”şehîdên bêmirad” û di gul û beybûnan de xemilandin. Bi dawet û dengê lîle lîlan, Nisêbînê dîsa hejiya. Zarokan di kolanên bajêr de bi kêf xwe zer kirin hev û lîstin. Kezîzer û kezîreşan hepirî û lefahî ji serê xwe avêtin; di nîvê sûkê de dan ber hev û awir di xortan firandin. Cewzoyê bûblanî qîza xwe di ‘senene’ de ziqziqand û ji vî aliyê sûkê û heta bi wî alî pê re meşiya. Hin xortan qutikên xwe ên zendikdirêj şewitandin; qapût û çakêtên ku di kelkela germa havînê de li xwe kiribûn, bi ser ker û bergîlan dakirin; li bendava bajêr êdî nema bi pantor û şerwalan, bi mayo ketin avê. Kolanên Qijlê, bi bêceme, şerwal û fanêreyên li ser keçan, mîna kulîlkên biharê xemilîn.
Hersê sînemeyên bajêr jî hatin vekirin. Xwediyê sînemeya Qijlê Bilal, cara pêşî bû ku li Nisêbînê filîmê seksê xebitand û xort belaş derbasî hindur kirin.
Bihemedê Araqfiroş, bi vekirina dikana xwe re, wek setqe, pêncî şûşe araq li zilaman belav kir. Hin kesên ku belkî tu carî malboro ne kişandibûn, sisê sisê-çar çar xistin devê xwe û bêyî ku çixareyan pêxin, li nav sûkê piyase kirin. Li her derê bajêr çixareyên samsûn û maltepe bûn çirik. Pîremêr bi tizbî li qehwexaneyan rûniştin û bi qeremaçan lîstin. Ji her aşxanê dixana kebaban bilind bû. Her

kesî li çavên hev nerîn, ”ji xwe fedî” ne kirin û kebab û pîrzola xwarin. Henekpêkirina li ser kirîna goşt rabû. Qesaban bê ”eyb û fedî”, laşê mîh û berxan bi çengelan ve daliqandin. Digel ku bi haweyekî biha goştê xwe difirotin jî, di hikmê seetekê de heta bi hestiyan jî diqediyan...

134

BEŞÊ ŞEŞAN

1

Di duwazdehê îlona sala 1980î de yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê bi sê cemse esker ve girt ser Zorava. Di wê gavê de Heso bena rezê xwe lêdikir û Circîs jî xwe berdabû nav bîstanê Mendera Kevin. Eskeran ji Heso xuyanî dikir. Yuzbaşî piştî ku gundî derxistin ser bênderên binya gund û doza sîlehan li wan kir, refek eskerên xwe jî bi nav gun de şand. Eskeran jî xwe dadan hinduran û li tişt miştê qaçax geriyan.

Sarê qêriya:

”Faşîstino, kominîstino, emperyalîstino, sosyalîstino, ajanino, hûn hemû kûçik in!...”

Temoyê lawê wê nexweşekî di nav livînan de bû û eskeran jî bi qûndaxên G3an ew ji nav livînan radikirin. Sarê jî xwe avêtibû ser lawê xwe û bi tirkiya ku ji telebeyan hîn bûbû êrîşî wan dikir. Di dawiyê de eskerekî qûndaxek di defa sênga wê de jî werkir û ew da nav lingan. Lê eskerekî ew yeka hevalê xwe bi xwe ne xweş anî û Sarê ji nav lepê wî xelas kir.

Li tara jêr jî birek esker di mala Mîrzoyê Mitirb de civiyan û mal serûbinî hev kirin. Di eslê xwe de heger

Mîrzo ji jina xwe re negota:
”Keçê wê demaçê veşêre!” û deng ne çûbaya eskeran,
belkî ewqas lêdan jî ne xwariba.
”Zû demaçê derxîne!”
Mîrzo li xwe da mandelê:
”Qomandarên min, wilehî we şaş fêhm kiriye, yaho!
135
Min ne demaçe, kemaçe gotiye...”
Di dawiyê de demaça xwe wek kemaça xwe bi eskeran
da qebûl kirin.
Eskerekî di mala Erol Efendî de kitêba Lenîn a bi navê
”Sol komunizm bir çocukluk hastaligi”, dît û xwe çeng
kirin Erol. Lê Erol jî bi tirkiya xwe a delal, ê esker li berxist
ku kitêb a doktoran e û ji bo nexweşiya zarokên gund,
li ba wî ye.
Kenêr jî di wê hingamê de kitêbên Cegerxwîn avêtin
tenûra dadayî. Lê dîsa jî ji destên wan xelas ne bû. Onbaşiyekî
piştî ku şekirek da neviyê wî ê hevt salî, nevî jî
onbaşî bir ser tenûrê û jê re got:
”Kalo, aha di vir de Quran şewitand.”
Dev û ruyê Kenêr jî li vir felişandin.
Di saxtîkirina gund de, eskeran ji gelek malan pere,
xişr û xal û xeml û xêzên pîrekan dizîn. Jina Selîm li ser
bazinên keça xwe berizî wan. Him lêdaneke pîs xwar û
him jî bazin paş de venegerand.
Yuzbaşî, Kerîm bi dû Heso û Hûto jî bi dû Circîs de rê
kiribû da wan bînin gund. Kerîm jî mîna Hûto hîn jora
gund derbas ne kiribû li Heso diqêriya û digot:

”Apê Heso zû were eskeran gund li hevhilanîîînnn!...”
Heso jî çakûçê xwe bi hinc li erdê dixist û digot:
”De ji xwe re li vî zir ehmeqî binerin, dibê qey ez Elîkê Betê û Hemê Gozê me, kuro! Bê çawa xwe diçirînî û bang min dikî!” Piştî ku Kerîm xwe gihand ba:
”Lawo Xwedê xêr neke, dîsa çi qewimiye?”, got û rûnişt.
Ditirsiya. Him jî pir. Dilerizî. Devê wî jî sist bûbû. Kerîmê bêhnçikyayî mîna ku ne bi qasidiyekê hatibû, xwe
136
ji bîr kir û pê re kete devjengê:
”Çawa dîsa çi qewîmî ye, ma qey tu di guhê gê de yî, apo? Generalan şevê din li Enqerê derbeyeke eskerî kirine. Dest danîne ser meclisê û dane bin hikûmetê…”
Heso ji radyoyê bi meselê hisiyabû û dizanîbû ku wê eskeran bigirtana ser gund. Her gava ku generalan hikûmet têk dibirin û dest datanîn ser desthilatdariyê, digirtin ser temamê gundan; li gundiyan êşkence dikirin, hin digirtin û wekî din jî ew bi pereyan ceze dikirin. Heso bêyî maliyên xwe, bi Sarê re temamê xaniyan saxtî kiribûn û li kitêbên Reşo geriyabûn. Piştî ku kitêb bi carekê ve di tenûrê de şewitandibûn, kêfa xwe anîbû, ”Sarê, me ixbarçiyên xwe hemû şewitandin, êdî tu dikarî bê kul û xem razê”, gotibû, ji tirsa eskeran xwe ji gund dabû alî û şevder mabû.
Ji êrîşên eskeran ên bi şevê pir ditirsiya. Bi giştî eskeran mirovê ku bi şev ji mal derdixistin, dikuştin û termên wan jî diavêtin nav mayinan. Bi wî haweyî ji herêmê

gelek kes hatibûn kuştin.
”Îcar çi yaho, ewliya Kerîm! Hema ji wî wextê ku tê
bîra min û heta bi niha, li vê herêmê her roj derbeya eskerî
ye. Esker her roj devê me û hevsed bavê me diçirînin!”
Xwe aciz kir û bi hêrs herdu destên xwe hejandin:
”Erê kuro li vê ecêbê, em hîn ji bin derba Reyis xelas
ne bûne, vê carê jî qomandaran derbe li me kirin! Em
nema dizanin bê em ê ji ber van derban bi ku derê de birevin!
Em xwe di qu...ê kerê kin, di ku kin, yaho!”
Peyvika ‘yaho’ bi derketina telebeyan re ketibû zimanê
gundiyan. Pîremêran peyvik bi haweyê henekpêkirinê bi
kar dianîn.
137
”Apo tu meselê di çavên xwe de pir mezin dikî. Ji bo
revê sed rê hene. Mesele em dikarin erdên xwe bifroşin û
mala xwe bibin Izmîrê. Û weselam.”
Heso hîn bêhtir aciz bû. Dev ji lêkirina dîwarê benê
berda, dewaran bena rezê wî ji aliyê bakur ve xerab kiribûn,
kevirekî girover di kefa destê xwe de hişk zeft kir û
destê xwe bilind kir. Xwest ku lêxe. Di cih de poşman bû
û mîna ku bi rastî li ser rêya Izmîrê ne qêriya:
”Beraz lawê berêz, ma bi me dikeve ku ez û Sarê em bi
vî porê xwe ê sipî bi şeldim beldimkî bi hev re bipeyivin!
Em ê ‘ji ber şirikê herin ber mezrîbê’ ha! Em ê herin nav
‘sîkerim’ û ‘qoyerim’ ha! Lawê tirê ewliya ye jî...”
Kerîm li ber xwe ket.
”Min nizanîbû ku tu ê ewqasî aciz bibî, min ne ji tiştekî
got apo...”

Di eslê xwe de Heso ji telebeyan aciz bûbû, îcar kerbê xwe di serê Kerîm re derdixist. Dema ku çav li eskeran diket, Reşo û Serdar dihatin bîra wî û bêhna wî teng dibû. Li gora wî, temamê kurdan bûbûn hevalên partiyên wan û wan jî kurd berdabûn pêxêla hev.

”Erê kuro niha tu bi çi karî hatiye vir, ewliyayê jinan?”, got û bi lez û bez berê xwe da gund. Kerîm bi gotina wî re şiyar bû, xaşomaşî lê nerî û bêyî ku tiştekî bibêje hema da dû. Zû xwe gihandin gund, lê Circîs berî wan xwe gihandibû. Heso pêşî xwe berda nav koma pîrekan. Sarê, pîrekên gund di navtarê de li hev civandibûn. Jina Erol jî hatibû.

”Heso, binere tu ji wan bênamûsan danexwî, ha! Ma te ew sîleh di ku derê de veşartine?”

”Keçê sîlehên çi, tirkdijminê, hiş dengê xwe neke!”

138

Sarê devê xwe tije kir, lê gotina xwe paş de vegerand. Çavên wê bi jina Erol ketibûn.

”Heşî Erol Efendî û jinika wî, tirk hemû bênamûs lawê bênamûsan e. Ma ne hey wek hev e, di hikmê çar-pênc mehan de deh-pazdeh mêr li vî gundî hatin kuştin, hema bila deh-pazdeh mêrên din jî ji me bikujin û em ê serê xwe ji wan re netewînin û hew! Heso, me li himberî wî qomandarê teres piçûk nexîne, wek wî bipeyive, temam, ne?”

Dema ku Heso berê xwe dabû ser bênderan û ber bi yuzbaşî de dimeşiya, mirov digot qey mîrê mihelmiya ye, kubar kubar û tena tena diçû.

Di kêleka Circîs de, ew jî wek her kesî li ser pêyan sekinî.

Yuzbaşî darê xwe hejand û bi zirt got:
”Heso axa, dewlet baş bi we dizane ku heta bi jinên we jî reyisî ne. Û reyisî jî terorîst in. Îcar bê lam û cîm bila her kes sîlehê xwe teslîm bike!...”
Wê hîn bigota lê Heso rê nedayê:
”Dewlet baş pê dizane ku Heso axa, zilamên Reyisê terorîst ji vî gundî qewirandine...”
Piştî ku Circîs jî got ”Heso axa, bi qeweta Circîs axa ev yeka han kiriye”, Heso ji cihê ku lê sekinîbû dewam kir:
”Dema ku me û terorîstan di vî gundî de hev dikuşt, dewlet hîç ne dihat hewara me.”
Gotina wî li telê yuzbaşî ket. Bi hinc darek li zendê wî ê rastê xist. Darê duduyan bilind kir, Circîs destê xwe da ber dêr û dar circirand. Wî darê xwe vekişand. Darê wî ê dirêj û qalind li ser ruyê Kêzim ket. Kêzim hişk bi herdu çavên xwe girtin û xwe da ser qerevîzkan. Kanîka çavê wî ê çepê reş û şîn bûbû. Hinekî jî werimîbû. Di wê navê re
139
eskeran jî G3ên xwe di wan werkiribûn û fîşek ajotibûn derbê. Zoraviyan rêz girtibû lê ne ketibûn temenê. Yuzbaşî şîretkirî hatibû gund. Li gora Hesen bînbaşiyê ku li tugaya Mêrdînê piştî demekê wê rutbeya wî daketa yuzbaşiyê û heta ku bimra jî terfiya wî bilind neba, yuzbaşî divabû li Heso û Circîs ne xistibaya. Kumutanan wilo emir dabûnê. Li temamê herêmê pêşî wê bi qeweta maqûlên gundan sîleh bidana hev, dû re pere û dû re jî him maqûl û him jî mirovên ku av tê de digeriya bihatana girtin.
Circîs bi wê lepta xwe, di çavên Heso de bi qasî çiyayekî

mezin bûbû. Heso di bin perê wî de ji ser xwe çû, tirkî
ji bîra kir û bi kurdî dabelişandê:
”Tu çi xwe dizirzitînî! Heger tu dewlet bî ez jî milet
im; tu qanûn bî ez jî wetendaş im; tu şûr bî ez jî mertal im.
Ez bi te û tu jî bi min heyî, kerê çolê!”
Yuzbaşî qed ne li bendî bersiveke bi wî haweyî bû; qed
lê ne fikirîbû ku wê di rojekê de hin gundî bikarîbana
bêtirs li himberî zalimên wek wî bipeyivyana. Li herêmê
û heta li temamê bakurê Kurdistanê bêemriyeke bi wî
rengî ne hatibû kirin, heger hatibe kirin jî her tim bi lêdaneke
pîs, girtin û kuştinê dawî li wê yeka han hatiye. Li
Zorava bi vî haweyê niha ji xwe tu carî bêemriyeke wilo
çênebûbû. Yuzbaşî mîna quşûfê zer bûbû. Destên wî jî
hinekî dilerizîn.
”Heso axa kurdî qedexe ye, bi tirkî bipeyive”, got û
dengê xwe birî.
Heso ji ser venekişiya:
”De îcar ji xwe re li gotine baq, hi! Çawa yasaqtir
yaho, ben tirkî bilmîyordir...”
Bi peyva ‘gotine baq’, yuzbaşî li paş xwe nerî. Piştî ku
140
bi qûna xwe ve tiştek ne dît, tiştek jî li xwe çênekir û dîsa
guh da ser.
Kîn û mereza ku di hinavên Heso de gihabû hev, di
canê wî de dabû der. Canê wî mîna pelên çilo diricifî. Yuzbaşî
ev aliyê wî ferq kiribû. Jê daxwar. Di eslê xwe de hîç
pêwîst ne dikir ku li vê herêmê mirov bi esker û polîsan re
têketa devjengê. Heso jî di vê baweriyê de bû. Li gora wî

divabû mirov tu carî neketa qirika ”mêrikê bi sîleh.” Lê di vê bêhnikê de jî tam pê de çûbû. Bi qasî ku yuzbaşî gotin di ber xwe re berdabûn, ew jî ewqasî li gotinê degel bûbû û dabû nav.

”Heqê me jî û xeberdanê heye. Em salyana xwe didin dewletê û em li dayirên wê jî bi zimanê we dipeyivin. Vir ne dayira dewletê û ne jî qereqola Stilîlê û polîsxaneyên Nisêbînê û Mêrdînê ye. Vir gundê min e û mala min e. Ji xwe re li vê ecêbê binerin kuro, kes nizane bê bezê bin guhê bavê wî ji ku derê ye û lawê kîjan qûnê ye û di mala min de ji min re dibêje ‘tirkî qoniş’ yaho! Sen de getir tercûman! Hema ez qonişmîş nabim û çi ji qûna te tê texsîr neke!”

Yuzbaşî emir da eskerên xwe ku li terempêlên xwe siwarên. Kîna Heso gihabû serê bêvilê û ji wî jî xuya kiribû. Di vê bêhnikê de tam çûbû ser dînê Sarê û her tişt dabû ber çavên xwe. Circîs jî wek wî fikirîbû. Heger yuzbaşî jî xwe wek wî kiriba, Heso wê li gund biqêriya, piçûk-mezin her kesî dest biavêta çekan û êrîşî ser eskeran kiribana. Bi rabûneke wilo dibû ku temamê herêmê jî li bin guhê hev keta. Heso û Circîs ne bi tenê di çavên zoraviyan de mezin, di çavên serokeşîr û maqûlên herêmê de jî mezin bûbûn. Her kesî li wan nerîbû û li ber xwe dabû.

141

2

Qertelê ku di sênga zinarê çiyayê Gorgîs de hêlîna xwe çêkiribû, şevder mabû. Dara hejîra di nav çavên zinêr de, bi sura bayê sibehê re ji xwe re û mere direqisî. Tîrêjên

rokê di qelîştekên rizdên zinêr re xwe dabûn ser û di ruyê wî de mîna stêran vedabûn. Ji hindama şirtika mezelê hebîsiyan, pozê zinêr di nav komikên hewran de zikê ezmên dialast û weke heyva êvarê xuya dikir.
Xuşîniya dar û deviyan û xuşe xuşa co û cobarên Kurikê bi çemê Stilîlê re di newala Hebîsê de gihabû hev, bi ser silûmên çiyê de bilind bûbû û di guhên wî de dengê ribaba Mîrzoyê Mitirb dabû. Pê sihurîbû û di xew re çûbû.
Xewnek wî, li ber tembûra Qasimê Omerî ku hema di binya wî re li Hebîsê rûdinişt derbas bûbû û yek jî li ber ribaba Mîrzoyê Mitirb. Qasimo û Mîrzo ew ji wê dawetê rakiribûn daweta din û hata sibehê ew reqisandibûn. Dema ku Qasimo berî xatûna xwe rabûbû û pez bi çiyê de rast dikir, ew jî ketibû milê wî û bi xurfanî dawişandibûnê. Di xewa xwe a şêrîn de car carê keniyabû û teyrikên ku li derdora wî li ser şaxên daran lûsiyabûn, cefilî bûn. Ji serê zinêr, newal û sirt û pehnavên çiyayên derdor, mîna gwêşiyekî tirî di destê vî qeranê raketî de bû. Çawa bixwesta wilo dikarîbû bixwara. Çûkek jî bifiriya ji ber xelas ne dibû.
Agir ji devê keleşkofan pijiqî; çiya hejiya û ji rizdên zinarê ku bûbû asîgeha mêrxasên omeriyan û di vê neqebê re rê ne dabûn eskerên Lîwayê, zixur bi newalê de gindirîn. Gur bi teyr û tilûran ket û temamê tebayan nehişî ji mexelên xwe reviyan. Keroşka ku ji mextela Têlo rabûbû,
142
berê xwe dabû gund û di ser hev re diqulipî û diçû. Mextel, berqefa di binê zinêr de bû. Eskerên Lîwayê Têlo

kuştibûn.
Lê ne ketibû. Bi wî haweyî tu carî jî wê lê ne ketiba.
Her tim di sênga civatê de rûdinişt. Li qehwexaneyan pişta xwe dida dîwêr. Bi şev di rêyan re ne dimeşiya. Û gava ku li deştê radiza, erd dikola û li çiyê jî di hindurê qul û qulêr, qelîştek û rizdên zinaran de lat ji xwe re dikirin tabût.
Heger ne dest bi dest ba, di livînê de jî ne dihat kuştin.
Wan li berqefê girêdabû û ew jî di qelşeke zinêr de raketibû.
Mîna pilingekî ji pilingên çiyayê Mava xwe da ser hev, bû lepek û ji cihê xwe firiya.
Cibranê lawê Sêdiq nas kir. Li ser danî, lê di ber re berda. Qadirê xursî xwest ku piştê jê bistîne, li zinêr zîvirî. Wî rê nedayê. Di vir de gelek fîşek berdan. Bêhna wî teng bûbû. Heger Qadir hema pêyeke din biçûya, wê di vê carê de bikuşta. Mûsoyê nisêbînî bi fîşeka duduyan re ji şer fik kiribû. Mûso keleşkofa xwe avêtibû û reviyabû. Wî jî ne xwestibû Mûso bikuje.
Reşo bi fen çû wan. Bi haweyê ku wan bîne ba hev, ji ber vê starê çeng bû ber stara din û star û star vekişiya. Piştî ku Cibran û Qadir di pişt tahtê de gihan hev, Reşo cercûrek di ser wan re berda û xwe di nav dar û deviyan de winda kir.
Di vê navê re jî sê-çar cemse eskerên ku ji tugaya Mêrdînê hatibûn Stilîlê û ji wir jî wê bi nav omeriyan de hilkişiyana, koçmal stilîlî derxistibûn gasînan û êşkence li wan dikirin. Yuzbaşiyê ku dotira rojê girtibû ser zoraviyan jî bi wan re bû. Gelek kes bi daran ve daliqandibûn.
Pîrekê xwe avêtibû ser termê lawê xwe û xeber ji eskeran

re dabû. Komutên ew jî kuştibû. Çend kesên hatxî bi teqîna ku li çiyayê Gorgîs bûbû, ji gund reviyabûn. Lê komutanê ku ji stilîliyan re digot ”hûn hemû reyîsçî ne” û goştê canê wan bi derbên daran re revandibû, ew deng ne bihîstibû û eskerên xwe dernexistibûn çiyê.
Ev cara sisêyan bû ku Reşo ketibû destên çekdarên Reyis û ji xetera mirinê xelas bûbû. Li gora Reyis, Reşo dikarîbû rêxistineke kurdperwer dameziranda û di wextekî kurt de bûba xwedî hêzeke mezin. Heta navê ”Fedayên Kurd” jî bi dû xistibû. Ji ber hindê ew mirovekî pir talûke dîtibû û bi çi haweyî diba bila bûba, Reşo divabû bihata kuştin. Lê Reşo jî Reyis zilamekî tarî dîtibû û têkbirina wî jî bi sazkirina rêxistineke tekoşer ve girêdabû. ”Berberî bê pere nabe”, gotina Heso xistibû serê xwe û çûbû Stenbolê.
Li wir hin hevalên xwe ên kevin ku ji ber Reyis bazdabûn û çend kurdên xeracxwirên pavyonan li hev civandibûn û dest bi tazîkirina dikanên zêringeran kiribûn. Bi devê demaçeyê du benqe jî tazî kiribûn.
Piştî ku bi hevalên xwe re li hev kiribû, vegeriyabû welêt, çend keleşkof û tibabê barek fîşek kirîbûn û ketibû çiyayê Omeriya. Di çiyê de li bendî hevalên xwe bû ku rojekê berî rojekê bihatana û dest bi şerê gerîlatiyê bikirana.
Li gora planê ku danîbû, pêşî wê li qereqola Axreşka çiyayê Mazî xistiba û piştî ku li herêma Xerza û Botanê li çend qereqolên din jî xista, wê li bajarên Tirkiyê şer bisinciranda.
Bi rabûneke wilo, wê xelkê herêmê li dor rêxistina wî biciviyana; bi alîkariya xelkê rêxistin li ser lingan

bisekiniya û di wê navê re jî PKPK û PKGK ya wê bi ordiyê re şer kiribana û yan jî wê bihiliyana. Wilo bawerî pê anîbû ku heger çepên tirkan yan hêzeke biyanî û heta
144
”kafir” jî bûbana, bi ordiya Tirkiyê re şer li dar bixistana, wê ji gelê kurd desteka xwe a herî mezin bistendana. Lê hesabê wî ê sûkê û malê li hev derneketibû...
3
Yuzbaşiyê ku bêdeng ji Zorava dabû rê, bi wê tevgera xwe zoravî bêhtir qutifandin. Gundiyan ew yeka wî delaleta nexêrê dîtin û gelekan xwe ji gund dan alî. Heso û Circîs jî hema di eynî rojê de sîlehên ku veşartibûn hemû dan ser hev û berê xwe dan tabûrê. Yuzbaşî sîleh qebûl kirin, lê hindik dîtin. Bi zimanekî xweş bi wan re peyivî û bi mebesta ku hîn sê çewal sîlehên din û pênc sed hezarî jî bînin, şandin gund. Heso û Circîs wek ku yuzbaşî xwestibû kirin. Îcar yuzbaşî jî piştî ku giha armanca xwe, herdu bi lêdanê nermijandin; xistin ber çend cendermeyan û berê wan ber bi tûgaya Mêrdînê de vekir.
Li êşkencexaneyê Circîs li ber xwe da û tîman lê şidand. Piştî ku di felaqeyê de çend tiliyên wî ên lingan şikenandin, serê zimanê wî dax dan û guhên wî çirandin. Circîs ne peyivî. Ben bi kîr û gunên wî ve girêdan û ew bi dû xwe de kişkişandin, Circîs dîsa ne peyivî. Tîman vê carê jî Sarê anîn û li himberî wî şilfîtazî kirin. Dîsa tiştek ji wan re ne got. Lê di wê navê re Heso jî ji wî û Sarê re ha ha digot: ”Sarê xem nake, fedî neke, qu...ê jina wan jî heye. Her kes dikare her teresbaviyê di mirovên hêsîr de

bike. Ma ev jî mêrxasiyeke qey!...
Kuro Circîso, dev ji vî aqilê xwe ê beredayî berde û her
tiştî ji wan re bibêje. Ma me çend carî ji hev re gotibû ku
mezinê çekdaran û ên eskeran hevalê hev in? Ma nayê bîra
145
te ku me dîlekçeyek dabû qeymeqamê Nisêbînê û qeymeqêm
xwe kerr kir? Ma dibe ku em li ser Reyis û zilamên
wî lêdanê bixwin? Mêrika mîna kose û berkoseyên Diyarbekirê
li me kirine. Ezîz Belayê mêrdînî ne ev. Kuştin bû
me hevdu kuşt; sîleh bû me da wan; pere bûn me ew jî da.
Îcar jî doza ku em 'reyisî' ne li me dikin û dixwazin em
van kaxetkên wan imze bikin. Imze bike, hey bêaqil!.."
Circîs ji ser a xwe ne hat xwarê. Tîman di dawiyê de bi
zorê tiliya wî di hibrê dakirin û li ewraqên ku li gora serê
xwe hazir kiribûn xistin. Lê digel ku Heso li gora dilê wan
peyivîbû jî, dîsa têra xwe lêxistibûn û ser dev û ruyê wî
pelixandibûn.
Eskeran ji bilî Kenêr, Hemo, Sadiq, Kerîm, Dasim,
Qaso, Mela Salar, Mîrzo û Erol Saticî, hin gundiyên din jî
girtibûn. Hemû jî piştî ku li tûgayê li dor du mehekî hiştin,
li ser maseyekê babet bi babet sîleh danîn, ew wek çekdarên
Reyis dan televizyonan, Seydo û Sarê berdan û ên din
rêyî mehkemeya eskerî a Diyarbekirê kirin. Mehkemeyê
yek ji wan jî berneda.
Gava ku li tûgayê û li temamê qereqol û polîsxaneyan
ji girtiyan rê û rêwanî ne mabû, çend cemse eskerên
tûgaya Mêrdînê û tabûra Nisêbînê jî kişiyabûn çiyayên
Omeriya û li Reşo digeriyan. Ew û Reşo bi êvarkî re di

neqeba Herbê û Cinata de li hev rast hatibûn û li hev girêdabûn. Ro ketibû pişt çiyê û berpal û newal ji dar û deviyan tarî bûbûn. Reşoyê ku sekmanekî di ser xwe re û gurê şevan bû, belkî wilo bi hêsanî ji dest wan xelas nebûya. Lê heger bi wan re ketiba şer û cendek bi ser cendekan de biqulipanda, dibû ku ew koma giran bişikenanda jî. Di dilê komutanan de bi qasî pilingekî sahw dabû!

146

BEŞÊ HVTAN

1

Piştî derbeya eskerî, Serdêr jî mîna gelek birêvebirên rêxistinên kurdan xwe berdabû Sûriyê. Li dor mehekê li Qamişlê mabû û dû re jî bi çend hevalên xwe ve hilkişiya başûrê Kurdistanê. Partiya wî wilo qerar dabû. Di bin sîha Partiya Komunîstên Iraqê de, li herêma Bahdînanê di kêleka çemê Xabûrê de meqerek vekiribû. Komunîstan bi her haweyî alîkarî bi wan re dikirin. Heta çend arpicî û keleşkof jî dabûn wan. Lê di eslê xwe de alîkariya herî mezin Serdêr bi wan re dikir. Ji sînorê Bahdînanê û heta ku digiha Cizîra Botan, alîgirên PKGKê hebûn û Serdêr jî ew hemû xistibûn xizmeta komunîstan. Alîgiran her ji çendeyekî karwanên komunîstan derbasî Binxetê dikirin. Serdar li herêma Botan wek serokê partiya xwe dihat naskirin. Wî bi xwe jî rê dida vê yeka han. Partiya Komunîstên Iraqê çend nakokiyên cidî xistibûn nav endaman, partî ber bi Sovyetê de kişandibûn û endam berdabûn pêxêla hev. Pirên endaman qanih bûbûn ku dev ji dîtina xwe a çakdarî berdin; lê li ser ku dewleta Sovyetê ji sosyalîzmê

derbasî komunîzmê bûbû, li hev ne kiribûn. Li gora hinekan, dewletê komunîzma Marks a li ser kaxetê bi carekê ve pêk anîbû û heta derbas jî kiribû. Di eslê xwe de grûba ku Sovyet ji ”merheleya pêşî a komunîzmê” derbasî merhela dawî kiribû û a ku digot ”na hîn li ser xetê ye” li hev kiribana, belkî her tişt safî jî bûba. Li ser ku bê kî bêhtir komunîst e, tiştekî zêde bi hev daketibûn û xwe rakişandibûn hev. Li Binxetê birêvebirekî xwe kuştibûn.
147
Endamekî komîta wan a navendî ku xelkê jê re digot ”Textor”, li dor sed kesekî alîgirên partiyê dabûn dû xwe û di çiyê de herimî bû. Di rojên ku hema kirî wê li eskerên tirkan biteqandana, birêvebirên partiyê bi haweyekî ew qanih kiribûn û ji çiyê daxistibûn.
Dema ku Serdêr li Bahdînanê bêyî partiya xwe biryara şerê çekdarî dabû, bi dizî kar û barê xwe dimeşand û cara duduyan bû ku sê hevalên xwe bi hewara Reşo ve gihandibûn, çiyayên Omeriya jî bi qasî ku nema bikariba Reşo bistiranda, piçûk bûbû. Li Stenbolê hevalên wî hatibûn girtin û armanca ku pê rabûbû berav û berav çûbû. PKGKî hemû ketibûn tolaqa canê xwe û desteka wan ji ser qut bûbû. Ji tirsa zilma eskeran, gundiyên ku alîkarî pê re dikirin, pişta xwe dabûnê û bê kes û kûs li wan navan mabû.
Agirê hovitiyê li çiyayên Omeriya dilîst; ne dengê kew, şalûr û bilbilên ku dar û devî direqisandin û ne jî bêhna gul û rihan û nêrgizekê dihat. Berqef bûbûn kemîn, rizdeyên zinaran bûbûn asîgeh, qulên teban bûbûn tabî, şikeft bûbûn qerergahên zilmê. Û xortekî ku xetên simbêlan rast

kiribûn, mîna teyrikekî di nav de diperpitî. Roj lê bûbûn şev û şev jî lê bûbûn roj. Mirov digot qey gur bû; bi rojê xwe vedişart û bi şevê jî xwe berdida gundan. Bi dizî diket malên ku çavên wî jê dibirî; nan didizî û bi rêya xwe de diçû. Bi wê diziyê gava ew bidîtana jî belkî dengê xwe lê ne kiribana. Li Sîtê şevekê ketibû mala mamosteyê gund. Mamosteyê azib jî mal jê re hiştibû û bi qîr û hewar xwe bi nav malan de berdabû. Li Hebîsê jî ketibû mala Qasimê dengbêj. Qasim ew dîtibû; dilê wî bi halê wî şewitîbû û li ser giriyabû. Li gora ku Reşo digot, ji wê şevê û pê ve Qasim mîna ku xêra miriyan bide, her şev teşteke nan û
148
selikek mewîj jê re li devê derî danîbû. Ji malekê du solên derbê dizîbûn, lê herdu jî takêş bûn. Û bi ser de jî yek piçûk û yek mezin bû. Goştê lingên wî bi lat û tahtan ve mabû, dikuliya û bi teqil diçû. Ew çavên wî ên wek tasan çûbûn xwarê, ew bejina tîtalî lê bûbû bar; mîna gopalekî li hev geriyabû. Ji neh-deh gavan bêhna genî jê difûriya. Dujîn mabû. Sipî ketibûnê. Bîrovê girtibû nav şeqên wî. Carina difikirî ku xwe bikuje lê xeyalên wî ên mezin rê ne didan kuştinê. Heger tarîxa dinyayê û di hindurê vê tarîxê de zilma ku bi serê mirovatiyê de hatibû nizanîba, dibû ku xwe bikuşta. Şeva ku dîsa ji bo diziya nên hatibû Zorava û ketibû mala xwe, Sarê pê hisiyabû û tahn dabûnê, ”ka qaşo te ê ji me re keleh fetih kiribana, li vê birekê her kes dizane ku tu bûyî dizê nên!...” Ranehiştibû nên û heta ku pişta rez jî derbas kiribû mîna zarokan giriyabû. Ji xwe re digot û dibiland:

”Sebebên vê rezîltiya ku ez ketimê çi ne? Belkî jî wek Aydin bû, sebebê vê rezîltiyê ev G3a di destê min de ye. Heger min jî wek wî kiriba ez ê niha ne di vê rewşa xerab de bama. Na, ne wek wî ye! Hobbes bi derewan ne gotibû ku ‘insan gurê insên e. Insan insên, heywan heywên dixwe.’ Insan hinekî bûne insan lê tirk hîç ne bûne insan heta ku ez jî bikaribim vî sîlehî biavêjim. Aydino jî ji min re rewşenbîr e qaşo; gur û berxê ji hev nas nake(!) Tirk xwe gur û min jî berx dibînin. Heta ku xwarina gur goştê berxê be, gur kedî nabe. Ma berx dikare gur hedayet bike? Na. Gur bi qewet e yan berx? Gur. Naxwe wî çaxî jî zalim wê nikaribin bibin maqûl û xwedî merhemet.
Erê ev çima ez ewqasî ji derb ketime? Belkî jî karê ku ez pê rabûbûm zêdî qeweta min bû, ji ber hindê. Ez zarok
149
bûm û min xwest ku ez mezinahiyê li bav û kalan bikim. Zarok û siyaset, ha! Lêbelê ew bav û kal ji min jî zaroktir bûn. Divabû hinekan ji me li xwe biqewimandaya. Dibe ku min çewt kiribe, lê cezeyê wê çewtiyê jî divabû ne ewqasî dijwar baya! Em kurd nikarin bibin insan. Na, ê ne insan ez im. Gelo ez ê bi çi haweyî xwe ji vê kûçkaniyê xelas bikim? Hema a herî baş ku ez xwe teslîm bikim û di girtîgehê de çend salekî rakevim. Offf, ez çawa dikarim wilo rezîl bifikirim! Na. Heta bi dawiyê ez mecbûr im li ber xwe bidim. Ev doz wilo ye. Rêya şoreşê bi çiv, kaş û newal e û di her derê wê de jî kelem hene. Divê ez çivekê wilo bidim xwe ku ez bikaribim xwe ji ser van keleman dagerînim. Xwe li ber bigire. Wê hin mîna dapîra min tahnan

li min bidin, mîna Qasimê hebîsî hin li ser min bigirîn, mîna Selmanê hatxî hin cihê min bizanibin, bi lêdana eskerên tabûra Nisêbînê xwe bidin kuştin û min nedin dest. Û wê hin xwefiroş jî li kuştina min bigerin. Kurd jî miletek e. Ji bîr neke ku qencî û xerabî bi hev re dijî. Ez bi xwe jî ji xulqiyeta qenc û xeraba me. Ez hebûneke pir sebebî me. Insan ev e. Tiştekî mikemel tuneye. Li ber xwe bide, rê hene lê tu bi ser venabî, ehmeq. Erê ezbenî bi vî haweyî tekoşîn nabe, ez di nav êgir de me. Îcar çi yanî? Fîlozofê îtalî Bruno Gîordono jî çaxê ku li himberî dêrê derketibû, Engîzîsyona Romayê ew heşt salan girtibû. Piştî heşt salên girtîgehê, Bruno dîsa jî ji ser a xwe ne hatibû xwarê. Dema ku Engîzîsyonê ew bi saxî avêtibû nav êgir, wî jî ha ha bang kiribû, 'ê ne ez ê neyêm ser îmana we!...' Ê ne ez ê jî tu carî teslîm nebim, pevçûn!..."

Li Kurdistanê çerxa zemên xerab dizîvirî; zalim xurt bûn û ew jî bi tena serê xwe bû. Ji tirsê pê ve di aqilê wî

150

de tiştekî tebût ne mabû. Carina ji sîha xwe jî ditirsiya. Ji destê tirsê ji bîr kiribû ku têkiliyên insên bi qasî mezinahiya dinyayê fireh bûn. Rewş çi diba bila bûba, helbet dîsa jî rêyeke serketinê peyde dibû. Bi tirs radibû û rûdinişt, dixwar û vedixwar û difikirî. Heta bi xewa wî jî hemû bi kabûsan derbas dibû. Şevekê dîsa di xew de xwe li nav birek esker qelibandibû û bêmefer bazdabû. Cefilîbû; eniya xwe li çimê tahtê xistibû û bêhemdî xwe qêriyabû! Ji şensê wî re ku esker li çiyayê din veketibûn. Çermê eniya wî li ser movikekê qelişîbû.

Mirîşkê pîsî dinikiland û insên jî goştê wê dixwar. Gur goştxwir û ker jî giyaxwir bû. Lê gur hûrik û ker jî girs bû. Yek ji van jî ne dihat bîra wî. Kê dizanîbû, heger giraniya temamê welêt li ser milên xwe hîs ne kiriba û bi tenê lixelaskirina xwe geriyaba, belkî jî ewqasî ne ketiba tolaqa canê xwe; ji hesaban bireviya û wek ku dixwest tevbigeriya. Helbet şer û pevçûnê mirov bi ser hev de dişidand û mêrxasî dida mirov. Dibe jî ew mêrxasiya wî a demekê ji wir dihat. Lê ûjdanê wî rehet bû. ”Mirina zanayekî mirina welatekî” bû û wî jî bi wî çavî li xwe dinerî. Serdar ne diket serê wî. Partiya wî gundî didît û li gora wî jî gundî nikarîbûn bûbana mezinê welêt.

”Serdar gundiyekî wek Mao ye”, digot û dibiland. Helwesta wî a li himberî Reyis di warê felsefeyê de jî guhertineke mezin pê re çêkiribû. Mao û Stalîn herdu jî cahil û barbar didîtin. Di eslê xwe de ji ber ku Reyis ji wan hez dikir, wî jî nefret ji wan kiribû. Û ew nefreta wî rê dabû ku kitêbên wan careke din bixwîne û bi seriyekî serbixwe wan nas bike. Bêyî ku troçkîzm xwendibû ji Troçkî hez kiribû. Kî dizane heger Reyis ewqasî heyranê Atatirk

151

ne dîtiba, belkî bi wê êcêbê ji Atatirk jî aciz nebûya.

”Serdar jî wek Maoyê destbixwîn dixwaze ku şer ji gundan ber bi bajaran de bibe. Belkî li Çînê dibû, lê li Kurdistanê hîç nabe. Him a me ne ew e jî. Bi şerê xwe em ê Tirkiyê xerab bikin ku tirk ji welatê me derkevin. Partiya Reyis li Hîlwanê axa têk birin û dest danî ser erdên wan; lê dewletê jî dest danî ser her tiştî. Çepên tirkan jî

divê ku pêşî ji bajaran dest bi şer bikin. Ew teoriya Lenînê ku digot ‘pêlê şoreşê ji rohilat ber bi roava de diçe’, çewt e. Heta ku sosyalîzm li welatên Ewrupayê pêk neyê, li welatê gundiyan wê tu carî pêk neyê û her tişt jî têk here. Gundî wê çawa bikaribin mezinahiyê li welatan bikin(!) Ewrupiyan dewra xwe a gundîtiyê derbas kirine, hemû bûne bajarî û xurt in. Teknîk û ilim li wir e. Gundî kî ne ku bibin mezinên bajariyan, bibin mezinê dinyayê (!)…” Seydo carekê duduyan pê ve çûbû. Lê piştî ku esker bi çûna wî hisiyabûn, ew jî mehkûm bûbû. Di dawiyê de dîsa bi gotina Reşo rabûbû, berê xwe dabû Stenbolê û ji wir jî wê xwe gihandibaya Swêdê. Lê koseyên stenbolî piştî ku qeflek pere jê stendibûn, ew teslîmî koseyên îzmîrî kiribûn. Wan jî piştî ku bi carekê ve ew ji pereyan xalî kiribûn, li Kûşadasi du şev û du rojan di embara keştiyê de veşartibûn; dû re jî li giraveke Yûnanê berdabûn û jê re gotibûn ”aha vir Swêd e, de heydê oxir be ji te re.” Seydo jî bi haweyê ku li Swêdê daketibû, ji xelkê pirsa polîsxaneyan kiribû. Li polîsxaneyê têgihabû ku hatiye Yûnanê.

152

2

Serdar bêyî ku têkiliyên xwe bi hin dewlet yan partiyan re deyne tevgeriyabû û haziriyên xwe ên şer qedandibûn. Ji komunîstan çend qenas û arpicî dizîbûn. Bi rêya pêşmergeyekî ji ”cahşan” sê doçka, çend bikîsî, tivingên birno, smînof û reşaşbrêm kirîbûn. Topek piçûk jî bi dest xistibû. Top bi nîv heqekî kirîbû. Serdêr ji çekên giran bêhtir baweriya xwe bi xelkê Botanê û Reşo anîbû. Li

gora wî, xelk çekê herî giran bû; her tişt bi xelkê dibû, dimeşiya û diqediya. Û Reşo jî mêrxasekî zîrek bû. Di eslê xwe de ji mêrxasiya wî bêhtir heyranê zîrekiya wî bû. Reyis şeytanî bû û şeytên jî dikarîbû alimên herî mezin bixapanda. Wilo li bûyerê dinerî. Di wê dema ku ew şerê dijwar bi hev re kiribûn, çend carekî Reşo ketibû ber devê tivinga wî û dîsa jî taqet ne kiribû wî bikuje. Bawerî pê anîbû ku wê dijminê wî di rojekê de dev ji partiya xwe berda û bigiha partiya wî. Lê Reşo jî her tim partiya wî eşîr û ew jî axayekî vê eşîrê dîtibû.

Dema ku Serdar di çileyê çil de bi dû Reşo de hatibû herêma Omeriya, Reşo jî nîvê şevê di besta Çûva re li eskeran teqandibû û xwe berdabû binya xetê. Lê zilamên Reyis ew li wir jî rehet bernedabûn. Li cem mixaberatan ixbara wî kiribûn û mîna kulmozê lê der bûbûn. Heger ne ji zîrekiya PKGKiyan ba, wê çekdaran Reşo li Qamişlê di mala yekî bûblanî de kuştibana. Bi qasî ku çekdar û mixaberatan dabûn dû, PKGKiyan jî ewqasî nahtorî lê kiribûn.

Lê hay û bayê Reşo jî ji wê hofka ku li ser kuştina wî hatibû gerandin, çênebûbû. Piştî ku PKGKî ew ji malê revandibûn û jê re gotibûn ”tu ê bi tena serê xwe tu carî nikari-

153

bî li vir bijî; tu mecbûrî ya bibî hevalê me û yan jî bibî hevalê partiyeke din”, Reşo dîsa sipasî wan kiribû û teqeze li hidûd xistibû. Di vê carê de esker pê ne hisiyabûn.

Bayê kur serê çûkan dibiraşt; bi sariya sibehê re rabûbû û temamê hewran xêz vêz kiribû. Dilopên ku ji rizdên zinaran diniqutîn, di qelîştekên lat û tahtan de qeşa girtibûn.

Av di hewdan de bûbû kelpîç. Lapûşkên teyran erd ne digirtin. Teyrik ji ser tahtan dixijiqîn. Gelek zinzinîk qerisîbûn. Felqeyên zemzelîqê mîna şûr û rim û mertalan di pozê zinarê Dojderê de kişiyabûn. Bayê ku di sirtê de difîkand û di newalê de jî dikwîtand, di qorzîbirên şikefta Şikefstûnê de li hev diciviya, kurkê Reşo mîna meşkekê dinepixand û lê dizîzikî. Teyrikan bi lez û bez çêra xwe dikirin. Ro bi ser çiyan ketibû û tîrêjên wê meyl û veketî dihatin erdê. Qeşa ku bi keziyên dar û deviyan girtibû mîna qesebê dibiriqand. Lê dîsa jî her der sar bû. Serê garana sarinciyan gihabû qûça Mirarîkê, lê garana gundikiyan hîn jî goristana gund derbas ne kiribû. Pez ji zû de ketibû newala Dojderê.

Reşo dengê Serdêr nas kir. Ruyê wî mîna gulekê vebû. Ji dema ku saloxdanên wî hilanîbûn, qûna wî erd ne girtibû. Bi kêf ji cihê xwe çeng bû û ber bi devê şikeftê de bazda. Piştî ku got ”li qisûra min nenere, min ne dixwest ez bihatama Gurik civanê te; çawîşê Stilîlê li ser min gurikî pir êşandine, min fedî dikir ez li ruyê wan binerim”, hevdu himbêz kirin û di taldeya latê ku di nêzîkî devê şikeftê de tibabekî bilind bû, rûniştin.

Herdu hevalên Serdêr jî di serê sirtê de li ser pêyan çavdêrî li derûdorê dikirin. Ji Sarincê mîna du tayikan xuyanî dikirin. Sekina bi wî haweyî talûkeyeke mezin bû.

154

Yekîneyên eskerî her roj li gundan digeriyan. Şikeft hema bi pehnavê vebû û raserî her derê bû. Di eslê xwe de Serdar çekdarekî bi tedbîr bû. Belkî jî ji ber tirsa devjenga ku

wê bi Reşo re nikarîba bibira serî, hevalên xwe ji xwe dûr sekinandibûn. Dibû ku Reşo aliyê xwe ê ilmî derxista pêş û ew di çavên hevalên wî de wek cahilekî bida naskirin. Li Enqerê carekê wilo lê kiribû. Lê di vê carê de piçûkxistina dijminê wî ê wextekî, wê tu fêde ne dabayê. Hewceyê wî bû. Serdêr bîra vê yekê ne biribû, lê Reşo bîr biribû. Dilê wî bi halê Reşo şewitî. Bêdeng qederekî rû bi rû li hev nerîn. Dû re jî serê xwe berda ber xwe û di ber xwe de peyivî:

”Hoooweh li me û vê rezaleta ku dijmin aniye serê me! Van tirkan av di hestiyên me de vexwarine! Tirkan lingên me xistine zikê me!”

Ji ber kela giriyê ku ketibû qirikê, gotinên wî ên liblibî û girs bi şikeftika qirikê ve dizeliqîn û gundorkî dihatin xwarê.

”Na, ne dijmin, me ev rezalet bi serê xwe de aniye; dijminê insên ê herî mezin insan bi xwe ye. Tirkan lingên me ne xistine zikê me, me lingên xwe xistiye zikê xwe. Dema me her rezaleta ku hatiye serê xwe xist stuyê dijmin, em ê jî wî çaxî tu kêmaniyên xwe nebînin û bi pêş de neçin...”

Serdêr piştî ku ji kûraya kezebê axînek kişand:

”Yanî te bawer kir ku partiya te ji teref dewletê ve hatiye avakirin, ne wilo?”

”Erê, min ji zû de bawer kiriye. Ji ber ku ji destpêkê de Reyis mezinê vê partiyê bûye û her tişt jî li gora dilê wî hatiye kirin...”

Serdêr henekê xwe bi aqilê wî kir û devlikenî got:

”Ne bi tenê Reyis, komîta merkezî hemû jî ajan in.”
Reşo xwe aciz kir:
”Na wilo nebêje! Reyis û çend kes ajan in. Bi rastî jî tu û partiya te hûn tam gundî ne. Krîterên ku we pê girtine ne tu krîter in. Hûn li pevçûna ku partiyê bi rêxistinên kurd û feodalan re kiriye temaşe dikin û gotinên wilo tirovirî dibêjin. Pevçûna bi feodalan û organîzasyonên siyasî re tiştekî îdeolojîk e. Îdeolojiya komunîzmê li ser vî asasî ye ji xwe. Partiyeke komunîst helbet wê bi feodalîzmê, reformîzmê û oportunîzmê re şer bike...”
”Lê we ne bi sîstemê re, we bi feodalan, reformîst û oportunîstan re şer kir...”
Ne xwest ku dirêj bike:
”Ew jî hinekî rast e. Lêbelê we hîn komunîzm fêhm ne kiriye; hûn nizanin bê sosyalîzm çî ye û hûn doza sosyalîzmê dikin. Ma Stalîn ajan bû ku li dor du-sê milyon insanên xwe kuştin? Na. Ma mirov dewaran dikuje? Na, lê Stalîn bîst-sîh milyon dewar û pezê sovyetiyan kuştibû. Mao bi navê ’Şoreşa Kulturî’, qetilam kir; şeş sed-hevt sed hezar welatperwer û ronakbîrên çîniyan kuştin! Ma ew jî ajan bû? Na. Polpotê cenewar ajanê kê ye? Ne ê tu kesî ye. Enwer Xoceyê ku li himberî Hîtler şer kiribû, bi sedan demokrat û endamên partiya xwe kuştine. Kîmil Sung, Fîdel Castro û hwd. jî ew pîsî kirine. Ma Berzanî ne dîktator bû qey? Belê. Lê ganêreyekî kurdan jî bû. Ne bi tenê ajan, komunîstên herî mezin jî dikarin çewtiyên herî mezin û terora herî dijwar bikin. Troçkî komunîstekî mezin bû, lê wî jî pir kesên bê guneh kuştibûn. Mirov

dibêje qey we tarîxa bolşevîkan qet ne xwendiye.”
Serdêr hîç ne dixwest ku pê re têkeve devjengê. Ne
156
dixwest wî aciz jî bike. Bêyî ku bifikire û jê re bibêje ”ma
li gora te, krîterên ajantiyê çi ne?” kin lê xist:
”Hevalo ne wextê felsefeyê ye, xwe bide ser hev ku em
bi rê bikevin”, got û destê xwe avêt bêrîka xwe.
Reşo rahişt şekirê wî ê nav kaxetê û bi ken got:
”Ji dêvla vî şekirî ve gerek te şûşeyekî viskî bianiya.”
”Mereqan neke, min ew jî aniye.”
Bi hev re mezin bûbûn; xwaribûn û vexwaribûn û
çûbûn bar, pavyon û kerxaneyan. Di şikeft û berqefan de
bazdabûn ser keran. Dil girtibûn û li ser siltana di dilê xwe
de her tişt ji hev re gotibûn. Di salên ku orte okul dixwendin,
bi mebesta ku ji berzaniyan re bombe çêkiribana, li ba
yekî omerî derz dîtibûn. Ji nav erdên mayînkirî, mayin
rakiribûn. Xwestibûn ku qeymeqamê Nisêbînê bikujin.
Bomba ku wê ji dûr ve biteqandana, xistibûn hindurê goka
naylonî; qeymeqam hatibû û wan pê li pişkokê kiribû, lê
bombe ne teqiyabû. Deremêt avêtibûn mala midîrê lîsa
Nisêbînê. Bi şev ketibûn pêşiya Mela Motorê ku pereyên
berzaniyan xwaribû. Bi sê-çar cihan serê wî şikenadibûn.
Mela ji mirinê filitîbû.
Firk ketibû pişta Reşo. Piştî ku bi hêdîka sênga xwe bel
kir, ”yaho ma niha hewara min û vê firkê bû”, got û
dewam kir:
”Çend hevalên te ên ji kuştinê re hazir hene?”
”Temamê herêma Botanê bi dû min de ye.”

Reşo dengê xwe hilda:
”Ez ji te re dibêjim ku te çend canfedayên vê dozê li dor xwe civandine? Şerê destpêkê ne bi xelkê, bi mêrxasan li dar dikeve. Xelk çî ye yanî! Xelk devê tivinga min û bêrîka min e. Pêşî bêrîk û dû re jî tiving lazim e.”
157
”Lê şer bêyî xelkê jî nabe, ezbenî.”
”Ew jî rast e, lê ne niha. Danheva gundiyan pir rehete, serê xwe pê neêşîne.
Baş e, te bi qasî ku em çend mehekî li Kurdistanê şer bikin sîleh û cebilxane peyde kiriye?”
”Ew jî temam. Netirse, pêdiviyên şerê ku em ê li dar bixînin hemû jî di destên me de hazir li bendî tene.”
Ro di nav devjenga wan re gihabû nîvê ezmên. Sura bê şikestibû û bi tesîra şerê ku wê bi dewletê re li dar xistibana herdu jî sincirîbûn.
3
Reşo û Serdar di halekî ne xweş de bi rê ketin.
Ji Gurik çiya bi çiya xwe gihandin çemê Dîcle û di hindama Qeraşê re li çem xistin. Piştî ku boxaza Qesrikê derbas kirin, di nav batûyan û di pişta şaxê re xwe gihandin kaniya Masiyan, Reşo zikêşî bû. Li vir bêhna xwe bernedan. Di Nêvava re xwe avêtin Bilika, çemê Xabûrê xelas kirin û li Sinatê Reşo ket. Du şev û du rojan li erdê ma. Bi rê de gelek caran berf û baran li wan bariyabû, xwêh dabûn û sarûgermê li wan xistibû.
Ji Gurik gundiyekî çit û jêhatî, ew jî bi şertê ku ne zivistan ba, di sê şev û sê rojan de dikarîbû xwe bigihanda

Sinatê. Lêbelê wan, ew rêya dûdirêj di çil seetekî de avêtibû. Bi rê de hîç ranezabûn. Û bi ser de jî danegeriyabûn tu gundan. Cilên wan ên şilo pilî çend carekî li ser wan ziwa bûbûn. Xwêhdanê di berstika qutikên wan re dabû der û li wan cemidîbû.

Serdar û Reşo piştî ku gihan cihê xwe, di hikmê mehe-

158

kê de haziriya şerê ku wê bi eskerên tirkan re li dar xistana qedandin. Li ser çûnê bûn. Li dora pêncî-şêst endamên partiyê bi xwe re amade kiribûn. Ji çiyayê Cûdî wê dest bi şer kiribana. Lê qasidê partiyê ji Serdêr jêhatîtir derketibû û şoreşa wî bi gotinekê re totlanî kiribû. Qêsid nameya partiyê ji temamê endaman re xwendibû. Li gora nameyê, Serdar xiyanet bi partiyê re kiribû; divabû ji komutaniyê hatiba avêtin û cîgirê wî Ziboyê diyarbekirî di şûna wî de bûba komutan.

Şoreşa wan dîsa têk çûbû. Zibo ji destpêkê de di wan hildabû. Komunîstan jî ew yeka han ragihandibûn serokê partiya wî û li ser bûbûn nahtor. Komunîstan ji serî de xwestibûn ku Serdar bikirana zilamê xwe ê di nav PKGKê de. Pere li ber xistibûn, qebûl ne kiribû; xwestibûn ku wî li Sovyetê, Bulgarîstanê an Kubayê bidin xwendin, dîsa qebûl ne kiribû. Di dawiyê de wan jî mîna komunîstên tirkan çekên xwe ên herî mezin bi kar anîbûn û hin keçên xwe ên sipehî xistibûn dewrê. Keç bûbûn benîşt û pê ve zeliqîbûn; lê wî jî bi çavên xuşk û biratiyê li wan nerîbû. Piştî ku komunîstan bi temamî destê xwe jê şûştibûn, Zibo kiribûn zilamê xwe.

Zarok fetisî çêbûbû. Li ber diketin. Te bi serê bêvila herduyan bigirta wê ruh ji wan biçûya. Dinyaya ku bi hêvî lê nerîbûn, bi ser serê wan de kumişîbû. Tîrêjên roka ku di nav perên hewrên Zorava de xwe berdabûn ser hezaza mejiyê wan, di kêleka çemê Xabûrê de bi bayekî reş re ji hev belav bûbûn. Gava ku ji qelaçên Dojderê barê welatekî danîbûn ser milên xwe, berê xwe dabûn Bahdînanê û bêwestan meşiyabûn, giraniya bêr bi qasî gilokeke pembo hîs ne kiribûn. Qesefa sênga wan bi bayê kîn û buxza bi

159

dewletê re mîna zirnazîqê hilatibû û dahatibû û wek pilingan kaş û newal qevz kiribûn. Li çiyayên bêper xistibûn, cih bi cih berf bi ser wan de herifîbû û gindirîbûn binê newalan. Ji rizdên zinaran kevir bi ser wan de herikîbûn. Hevalekî wan di çemê Dîcleyê de xeniqîbû. Digel wêqas zehmetiyê dîsa jî ji moral ne ketibûn. Di eslê xwe de heger ewqasî bêhêvî ne bûbana, bi tena serê xwe jî dikarîbûn şer bikirana. Û heta belkî bigihana nîvê meqseda xwe jî. Ji ber ku qeweta li ser herduyan bi qasî a tabûrekê dihat. Û tabûrê jî tabûr diafirandin. Tarîx wilo çêbûbû. Her kes bi tarîxê re ranebûbû, hin rabûbûn… Reşoyê ku di serî de wilo fikirîbû û xwestibû ku bi grûbekê şer li dar bixîne, dîsa ji bîr kiribû ku rêya şoreşê wê hemû bi kaş û newal, çiv û kelem derbas bûbûna. Bêhêvîtiya ji destê bêbextiyê tirs jî pê re çêkiribû. ”Tirs dijminê aqil e. Di kêlîkên tirsgirtinê de mirov nikare bi aqilî bifikire”, wilo gotibû.

Reşo bi bêbextiya Zibo re bi temamî ji şer dilsar bû. Giloka pemboyê ku rahiştibûyê, di çavên xwe de bi qasî

çiyayekî ji risês mezin kir û xwe ji bin vekişand. Daxwaza wî a pêşî têk çûbû. Vê carê jî dabû dû Serdêr ku ew jî bi xwe re rakira Ewrupayê û li wir xwe bidana ser hev heta ku welatê wan, ji hewran xêz vêz bûbûya. Lê Serdar jî bi haweyekî din difikirî. Bi çi rengî diba bila bûba, divabû partiya xwe ji hev belav bikira; ji wan kesan partiyeke nuh dameziranda û bi dewletê re şerekî mezin li dar xista. Serdêr Reşo qanih kir. Herdu bi karwanekî komunîstan re ketin rê û berê xwe dan Binxetê. Lê dîsa bi wan re hilnehat: Li derdora şirnexê bi şev karwan li kemîna eskeran qelibî, bi teqîna pêşî re çend kes ji karwên hatin kuştin, gajopij li karwên ket û her kesî rê ji ser hev winda kir.

160

Berê Serdêr ber bi Bahdînanê û ê Reşo jî ber bi Cizîrê de vebû.

Reşo di a dinî şevê de ji Cizîrê bi dizî xwe avêt qeresêla qemyonekê û li hindama Nisêbînê daket. Hema pê re jî xwe berda bajêr. Li mala dostekî bapîrê xwe bû mêhvan. Di a din î rojê de bi mirovekî nisêbînî re têkilî danî û ji bo binxetkirina xwe bi tibabek pere li hev kirin. Lê çi fêde, rêberê wî ê ku bi yuzbaşî re kar dikir, bi wî re jî xayin derket; ew bir stasyona ser hidûd û teslîmî esker û polîsan kir. Reşoyê ku temamê xeyalên wî bi bayê zilmê re firiyabûn, du şev û du rojan li tabûra Nisêbînê hiştin. Li vir êşkenceyek bê hed û hidûd lê kirin. Dû re jî ji vir nîvmirî rast ew rakirin tûgaya Mêrdînê.

Serdarê ku di girtina Reşo de xwe berpirsyar dîtibû jî, piştî girtina wî bi mehekê filan, bi sêzdeh hevalên xwe ve

ji Bahdînanê bi rê ket û bi qahr berê xwe da Nisêbînê. Seet li dor nehê şevê ji sê aliyan ve dora tabûrê girtin û tibabê pazdeh-bîst deqîqeyan lê reşandin. Dû re jî berê xwe dan stasyona ku hema bi tabûrê ve bû û wan û eskerên li vir dest bi dest li ser hev danîn. Ferzoyê qosarî di vê hingamê de hat kuştin. Ew jî hemû ji ber xezeba Serdêr bû. Ji her der wî agir dibijiqî. Xwîn rijiyabû çavên wî. Xwe winda kiribû. Di eslê xwe de heger esker ji desthilanîn ne ketibana, tev de jî dikarîbûn bihatana kuştin. Şerê bi haweyê wî mêrxasiyeke kurdî bû û bi roj ew taktîka mêrxasên kurdan, dikarîbû bi serketa. Serdarê ku di bin tesîra mêrxasiya Elîkê Betê de mezin bûbû û di şeran de bi çavên wî li xwe dinerî, ”betêkî” kiribû. Di geliyên Tinatê de Elîk jî bi serekê peyayên xwe Şemhûnê Henêhîndo û bîst-sih peyayên xwe ên bijarte ve, ji ser qesra Cemîlê Eshed yekbez

161

ajotibûn ser top û metilyozan û hemû hêsîr girtibûn. Bi qîr û navtêdanên Serdêr gişan jî, mîna qertelan xwe ji ber vê vagonê avêtibûn ber vagona din û xwe di eskeran werkiribûn. Heger fîşekên wan hindik ne mabana, wê êrîşî polîsxaneyê jî kiribana.

Piştî şerê li stasyonê bê teqîn ji bajêr derketin; bi dizî di besta Darê re li hidûd xistin û derbasî Amûdê bûn. Heger av li ser xwe ne zelilandibana û di stasyonê re xwe berdabana Qamişlê, wê eskeran bi qeweta eskerên Sûriyê ew di eynî şevê de qepaçe girtibana. Gelek caran wilo bûbû.

Hevalekî wan î hêja xesirîbû. Lê wan jî li stasyonê

pênc û di hindurê tabûrê de jî eskerek kuştibû. Serdêr miradê xwe kiribû. Lêbelê xelkê Nisêbînê û dû re jî ên Qosarê û Cizîrê bedêla miradê wî pir biha dan! Bi sariya sibehê re ji kolordiya Diyabekirê û tûgaya Mêrdînê bi hezaran esker kişiyan van hersê bajaran. Pêşî trafîk sekinandin û telefon qut kirin. Dû re jî bi tenqan, kariyer û cemseyan derdor zeft kirin û mîna gurên har xwe dadan hinduran. Li hewşa tabûra Nisêbînê, mizgefta Zeynelabidîn û li jora pira Eleman, li ser şemedanê xuya kesmûkî rijandin, bi sedan kes şilfîtazî kirin, li wan siwar hatin û li ser vê xuyê birin û anîn. Qîr û hewarên insanan erd û ezman dihejand. Xişr û zêrên jinan, pere û temamê tiştên bi qîmet talan kirin; mîna keriyê berazan ku digirtin ser dehl û werzan û her tişt xirîxopan dikirin, wilo bi serê Nisêbînê de anîn! Li vî bajarê ku her tim bûbû pira tarîxê, gelekan bi derbeyên dar û qezetoran can da. Û bi sedan jî mirov birîndar kirin!...

162

BEŞÊ HEŞTAN

1

Sala 1985an xweş lêkiribû. Li deşt û çiyan bihar ketibû. Xêr û bêr fûriyabû. Hingiv di kewaran re dabû der. Mîha herî kesaxî, qorepîr û kulek ber dabû. Dengê bilûra şivanan li dist û mexmeran vedabû. Mast bûbû qeymax; qeymax bûbû nîvişk û bi ser jar û hejaran de herikîbû. Feqîrên ku li taseke dew diheyirîn çeqilmast vedixwarin. Heta bi gavanan jî penêrê ter dixwarin. Simbilên ceh û genimên ku di şîrik de piçpiçîbûn û bi sura bê re pêl didan,

bayekî hênik bi xwe re hiltanîn û li deştê belav dikirin. Ji serê çiyayê Kurê qopaniya gundê Qesra, di nav pêlên şînahiyê de mîna giravekê xuya dikir. Biharê Serxet û Binxet kiribû yek. Ji nav mayinan bêhna endeko, gul û beybûn û sosinan difûriya. Qendirxeyên ku bi qasî dar û deviyan bilind bûbûn, şiva tirênê û têlên erdên mayînkirî winda kiribûn. Hestî û qahfûrkên serê kuştiyan bi kulîlkên şehfel û xerdelê hatibûn nixumandin û her derê hidûd mîna bexçeyên Zinarê geş û şênî bû.

Dewletê ya jî eskeran guhertineke mezin xistibûn herêmê. Giraniya xwe danîbûn ser avakirina mizgeftan û lîstika futbolê. Melayên ku ji teref dewletê ve bê dîplome dihatin zanîn, ji melatiyê avêtibûn û melayên xwe ên bi dîplome di şûna wan de bi cih kiribûn. Dîplome jî di eslê xwe de bi xwendin û nexwendina dîn ve ne girêdayî bû. Piraniya melayên wan ji kesên ku hew bi tenê Quran xitim kiribûn pêk dihatin. Gelek ji wan xort jî bûn. Stilîliyan bi destpêkê re yek ji van xortan ji rê derxistin; di ser makerê

163

de sûretê wî kişandin û ji reyisê Komara Tirkiyê re şandin. Di vî warî de bi rastî jî stilîlî û bûblanî pir bê insaf bûn. Herdu alî li ser pîskirina melan bi hev re ketibûn qayişê. Heso destûr dabû zilamên xwe ku hemû marîfetên xwe ên xerabiyê li himberî wan bi kar bînin. Mela Emînê torî mirovekî pîr î bê dûnde bû. Ji bo debirandina xwe bi haweyekî ji xwe re dîplomeyek ji miftiyê Mêrdînê stendibû û li Zorava bûbû mela. Zoraviyan xistibû serî ku bêdûndetiya wî ji jinikê ye. Zibêr mela xapand; ji kerxaneya

Mêrdînê qehbikek bi çend hezarekî qanih kir û li Nisêbînê mahra wan birî. Bi fenbazî piştî ku sûretê herduyan şilfîtazî kişand, sûret jî ji Sererkanê eskerî ê Tirkiyê re şand. Zoravî û stilîliyan ev sûret pir kiribûn û li gelek bajaran bi dîwaran ve zeliqandibûn.

Melayên dewletê xwe li ber bûblanî û stilîliyan ne digirtin; hemû jî xir dikirin. Di dawiyê de dewletê dev ji wan qeriya û nema mela ji wan re bi rê kirin. Lêbelê li Xerêba ku bi sofî û mirîdên xwe navdar bû, mesele bi haweyekî din geriya.

Melayê wan ê nuhatî piştî ku bi wan re bi kurdî peyivî û xwe bi wan wek mirovekî xwedayî da naskirin, sofî li mizgeftê civandin û bi tirkî dest bi wazan kir. Sofî hebitîn! ”Ev şeytan e!” gotin, hin reviyan û hinan jî êrîşî ser kirin. Li qirdê wan, di wê bêhnikê de zilma eskeran hat bîra hin sofiyan û dev ji kuştina şeytanê xwe berdan. Bi dû ku mela bi lêdanê nermijandin, li ser kerê şidandin û bi pîrekê ve berê wî dan qereqola Stilîlê. Dû re ker jî bi mesta ku rahiştibû şeytên kuştin. Bi dû kuştina kerê de, vê carê jî çend sofiyan keysa xwe li kuştina pîrê jî xweş kirin, lê pîrê ji wan bi kêrhatîtir derket û ji gund reviya.

164

Dewletê digel ku heyfa mela pîs ji wan hilanî, dîsa jî dev ji wan berneda û melayekî din şand gund. Heger stilîlî ne ketibana navbera sofiyan û mela û bi şertê ku sofî bi dû mela de limêj nekin, sofiyan her meh du sed wereqe ne dabana mela, wê xerêbaniyan bi carekê ve ji gundê xwe bar kiribana.

Komutanan di mista çawîş û başçawîşan de li her gundî taximên futbolê saz kiribûn. Her hevte taximê vî gundî divabû bi taximê gundê din re bilîsta. Cezê nelîstinê giran bû. Ji bilî dana peran, lêdan û girtin jî hebû. Di destpêkê de hema hema li her gundî bi qasî ku taximekî futbolê pêk hatiba, xort ne mabûn. Gundiyan pêşî xwestin ku lîstikvanên xwe ji zarokên deh-duwazdeh salî pêk bînin, lê komutanên qereqolan qebûl ne kirin. Lîstikvanên zoraviyan ji bilî çend xortên pazdeh-şazdeh salî, ên din hemû jî pîremêr bûn. Dema ku Xelef li aliyekî û Zibêr li aliyekî dida ber gokê, piçûk û mezin her kes derdiket ferca wan û ji ken û girî li piştê rast dibûn. Car carê komutan jî bi eskerên xwe ve dihatin fercê. Gundî bi vê hatinê pir aciz dibûn. Gava wan xwe bi xwe dilîst, pantor ji xwe ne dikirin. Lê li pêş eskeran mecbûr bûn ku tena fanêre û derpî bilîstana. Piştî ku Heso û Circîs jî bi vê yekê agahdar bûn, kêfa xwe anîn û gotin, ”dîsa jî mala wan ava ku vê lîstikê bi pîrekan nakin...”

Li gora mercên ku komutanan danîbûn, divabû salê du ‘kupa’ bihatana dan. Kupa jî beranek û pênc hezar wereqe bûn. Lê her gavê jî eskeran digirt. Bi rastî jî di vî warî de neheqî dikirin. Gundiyan li himberî wan him di temenê de dilîstin û him jî gava ku gol diavêtin ji wan re li çepikan dixistin. Carekê bamidiyan xwestin ku zora eskerên qere-

165

qola Stilîlê bibin. Felîtê bamidî da xwe û mîna cambazan gok bi vir de û wir de bir û anî. Lêbelê lêwik hîn xolê çardehan ne avêtibû, pehînek li bazinê lingê wî ê çepê xistin

û ew li erdê gevizandin. Bi ser de jî hakimê ku her carê ji gundiya bû û her tim jî a eskeran digot, da ser lêwik û futbol bi carekê ve lê qedexe kir.
Zoraviyan bi perên ku dewletê ji bo avakirina mizgeftan li temamê herêmê belav kiribû, mizgeftek ji a xwe bi wirdetir bi hişkeberê lêkirin û pere li hev payê kirin. Ji bo avakirina qubeyekê piştî ku dîlekçeyek dan qeymeqamê Nisêbînê û ji qeymeqêm tibabek pere stendin, vê carê jî serî li waliyê Mêrdînê dan û ji walî re gotin ku mizgefta bi qube bê minare nabe. Ji walî jî pereyekî baş girtin. Minara ku di danê sibehê de her tiştê wê qedandin, ji kevirên nikarokî li ser sê-çar metreyan bilind kirin. Di eslê xwe de a wan ne minare, qûç bû. Hema wilo êretî kevir danîbûn ser hev û bilind kiribûn. Qube jî bi haweyekî din bû. Quba ku ji tenûrên omeriyan mezintir û ji kozîdanên keçên bûblaniyan piçûktir bû, pîrekan ji heriyê çêkiribû. Kils jî kiribûn.
Li ser devê deriyê mizgeftê ”Osmaniye Camisi” û bi dîwarê minarê ve jî ”Koca Tepe Minnaresi” nivîsandibûn.
Lê çi fêde, bi barana pêşî re îcar çima mizgeft, qube û minare hemû jî bi ser hev de naherifin û eser ji tiştekî wan namîne. Zoraviyan bi dû vê bûyerê de, bi dîlekçeyekê dîsa serî li walî dan. Walî jî piştî dîlekçeya wan hema ne bi gelekî, sê rîhsipî ji gund xwestin. Zibêr, Xelef û Meshûd çûn. Di dawiyê de xerabkirina mizgeftê û her tiştê girêdayên wê xistin stuyê Xwedê, walî qanih kirin û dîsa qiyametek pere ji xwe re stendin.
166
2

Hesoyê ku di adara sala 1985an de ji girtîgehê hatibû berdan, mêşdana xwe kişandibû nav rezê xwe ê ku bi mirêbayî dabû. Hewşa mêşdana ku bi keviran lê kiribû bi hejikan rapêçabû û li ser hejikan jî seranser şaqûl vedabûn. Ji bilî van, li ser darên behîvan jî gelek şaqûl vedabûn. Bi rastî jî şalûran tiştekî zêde zêde êrîşî mêşên wî dikirin. Kirasê xwe biçiranda jî heqê wî bû. Mirov digot qey temamê şalûrên herêmê a xwe lê kiribûn yek, refek diçû yek dihat û bi haweyekî serxweçûyî xwe dadidan mêşên wî. Geh ji wan re li tenekê dixist, geh çifte berdidan wan, geh diqêriya lê dîsa jî fêde ne dikir. Hema çi dikir ne dibû. Li gund jî çend mêşdan hebûn, lê şalûr hîç bi ser gund ne diketin. Heso bûbû nahtorê mêşan. şalûrên ku diketin şaqûlên wî, li pêş çavên şalûrên ku li hewa dilîstin bi saxî diperitandin û dîsa jî şalûran xwe ji ser mêşdanê ne didan alî. Li girtîgehê ji xwe hinekî xulqteng bûbû, îcar şalûran jî bi wê nêçîra xwe xulqê wî ê mayî jî biribûn. Car carê berê xwe dida ezmên, mîna ku Xwedê didît, tiliya xwe dianî ber çavên xwe û bi gotinên çort diajot ser. Piştî ku miradê xwe li Xwedê û li herçar melekên wî ên sereke dikir, vê carê jî berê xwe dida gund û dibeziya Sarê. Di wê rewşê de çima rojekê Sarê wî zeft nake. Bi aqilê wî dikene û dibêje:

”Hey Reyis goştê te xwaro, ma min çend carî li talanê te xistiye ku tu van gotinên tirovirî bi min re dikî!..”

Hesoyê hazirbersiv jî di cih de xwe dabû ser hev:

”Keçê bi telaq min ne ji te re digot, navê jina qomandarê hepsa me jî Sarê bû...” gotibû û ber dilê wê girtibû.

167
Lê di eslê xwe de ne wilo bû: Li ser gotina Sarê mêşdan kişandibû nav rez, bêhntengiya wî hemû ji wir dihat.
Heso bi giştî rojên xwe li nav rez dibihurandin. Ne dixwest çavên wî bi çekdaran bikeve. Berî derketina wî û hevalbendên wî a ji girtîgehê bi çend mehekî, çekdarên Reyis li herêma Sêrtê avêtibûn ser qereqolan. Hin esker kuştibûn û çekên wan jî ji xwe re talan kiribûn. Çekdaran bi êrîşên xwe ên peyder pey û daber, hema hema hilfa temamê beg, axa û esnafên ku di salên derbasbûyî de ji teref partiya wan ve bi mal û canê xwe xesirîbûn kişandibûn ser xwe, xerabiyên xwe ên demekê bi wan dabûn ji birkirin û xwe li ber dilê wan şêrîn kiribûn. Xelkê şerê bi eskeran re bi Reyis ve girêdabû û ew wek qehremanekî didîtin. Mêrik di çavên her kesî de roj bi roj mezin dibû. Di wî warî de çekdaran jî temamê tevgera xwe di bin mezinahiya wî de dianîn zimên û ew serokekî bêhempa dianîn zimên. Qehremanî û seroketiya Reyis mîna şîrê li ser êgir, ha ha difûriya û bi nav xaka welêt de diherikî. Lê li girtîgeha ku ji sê pişkan du pişk û nîv jê ji çekdarên Reyis pêk hatibû, rewş hinekî cihê bû. Digel ku girtiyên hevalên wî gelek caran lêborîna xwe ji Heso û Circîs û ên wek wan xwestibûn jî, hemiyan bi şik li Reyisê wan nerîbûn û ew wek zilamê dewletê dîtibûn. Reyis di çavên Heso û Circîs de hîn jî ”ew zilamê bi pênc kurûşan” bû!
Li girtîgeha Diyarbekirê telebeyan li ber xwe dabû û bi dehan kes ji wan hatibûn kuştin. Û gelekê wan kuştiyan jî

hevalbendên Reyis bûn. Ew yeka han tesîreke mezin li ser xelkê, Heso û Circîs jî kiribû. Heso û Circîs di her tiştî de bihurîbûn û telebe efû kiribûn. Li gora wan Reyis, Şêx

168

Hesenê eferî bû û ên bi dû de jî mirîdên wî bûn; Şêx terqiyabû, mirîd bi serê xwe fikirîbûn û li girtîgehê bûbûn zilam. Bi xwe hisiyabûn ku bi axa û begên kurdan nebaşî kirine û ji axa û begên girtî jî lêborîna xwe xwestibûn. Mîna xulaman li ber destê wan çûbûn û hatibûn û dilê wan xweş kiribûn. Xwe şewitandibûn, ketibûn rojiya mirinê û miribûn. Bi salan tî û birçî û tazî mabûn. Bi derbên eskeran gelek ji wan dîn bûbûn; bi nexweşiyên giran ketibûn û felc bûbûn. Hemû hîn wilo xort û diran û porê wan weşiyabû...

Heso bi dengê kuxuka Kerîm re cefilî, qirçînî bi nava wî ket û di cihê xwe de wek qûçekê sekinî. Dizanîbû ku hatina wî ne ji xêrê re ye. Dem û dewranê du mirovên ku qet tiştekî wan bi hev ne diket, bi hev re kiribûn dost. Heso bi serê Kerîm û Kerîm jî bi serê Heso sûnd dixwar.

”Bêje bavê mino, îcar çî ye?”

Kerîm lêva xwe cût. Wî jî wek her kesî êşa xwe nas dikir. Dudilî bû. Ji ber ku ji destê wan dîtibû. Li ba wan cih bigirta, derdek û ne girta jî derdek bû. Dema ku nuh hatibûn Zorava jî dîsa wek niha li odeya Heso rûniştîbûn û xwe ji gundiyan re kiribûn erd. Helbet vê carê wê ne wek cara din ba. Hebûn û nebûna wan heta ku bi hêz bûbana di destê gundiyan de bû. Îcar piştî bi hêzbûyinê ku bergîlî derketibana, wî çaxî jî wê kevir li ser kevir nema û Kurdistana di dilê wî de têk biçûya. Kerîm wilo difikirî.

”Mêrikan hatine. Û dixwazin te bibînin.”
Bi gotina wî re çavên Heso lîstin. Bi hev re gelek tiştên telebeyan ên xerab hatin bîra wî. Kubariya xwe danî aliyekî û bi hêrs peyivî:
”Em ne mîh in ku em her tiştê wan qebûl bikin! Ew
169
zemanê berê çû; çawa hatine bila wilo jî herin! Kê ji wan re gotibû bila bên gund? Em ne kurd, weh! Em ne ji ometa mihemed jî, hi! De here wilo ji wan re bibêje û hew!”
Kerîmê ku hîn jî qerara xwe ne dabû, bi gotinên Heso re qerar da, yek ne kir dudu û bi lez da rê. Heso kire niçe niç. Vê carê jî zilma ku wî û telebeyan bi hev re li girtîgehê dîtibû, mîna filîmekî di ber çavên wî re derbas bû. Êşa wan di nava xwe de hîs kir û bi herdu destan li serê xwe xist:
”Kuro cidê pîrekan Kerîmo, bi ku de? Ma ji me re diserife ku hema wilo di cih de em di mala xwe de xelkê bêminet bikin, hi?...”
Heso mêşdan ji şalûran re berda; şalûrên ku ketibûn şaqûlan jî di wê rewşê de hiştin, da tengala Kerîm û hêdî bi hêdî ber bi gund de meşiyan.
3
Mîna ku şêxê şemeran derbasî odeyê bibe, gurînî bi civatê ket û her kesî ji aliyê xwe ve cih jê re vekir. Baranê ku li girtîgehê bi nefspiçûkiya xwe hilfa Mela Salar û Sêdiq kişandibû ser xwe, ber bi Heso de meşiya û xwe çeng kir destê wî; xwest ku maçî bike. Heso destê xwe ji nav destên wî kişand, lê wî berneda. Wî jî ruyê wî maçî

kir, xêrhatineke qurquçî di wan da û piştî pesin û sipasan di kêleka Circîs de rûnişt. Ode ji zilaman mirmirî bû. Ji hindama serşokê û heta ku digiha devê derî, xortan sef girtibûn; herdu sefên pêşî li ser qerevîzkan û a dawî jî li ser pêyan sekinîbû. Zilaman mîna kevirên benên rezan bê keys xwe dabûn ser hev û bi telkî rûniştibûn. Koma zaro-
170
kên ku Baran şekir li wan belav kiribû, bi dika hewşê ve wek gwêşiyên şînokan hatibûn xwarê û guhên xwe bi ser civatê de bel kiribûn. Navmaliya malê cihê du zilaman girtibû. Mela Salar dîsa li tenişta wê xwe berdabû ser kaban. Hûto vê carê li ser kulêv û bi ser de jî tam li himberî çekdaran rûniştibû. Şûf û kemlaniya wî bala wan kişandibû. Ji her kesî bêhtir li wî dinerîn. Hîn ew nas ne kiribûn. Gava ku bi wî qilafetê xwe ê mezin di civateke nenas de wek niha bêdeng disekinî, bi qasî şêrekî sahw dida. Lê gava ku dipeyivî jî civatê ew bi qasî pisîkekî piçûk didît.

Sadiq bi haweyê ku dixwest her tiştê xwe bi carekê ve bigota, bêwestan di cihê xwe de diqeliqî. Di dawiyê de xwe ne girt:

”Gerek ev şerê me û tirkan be, dîsa nebe ê me kurdan xwe bi xwe be...”

Hema pê re rengê çekdaran qulipî. Heso ferq kir ku ew dixwaze bîne ku derê. Di cih de gotina wî birî:

”Pîrê, ev xortên ha hevalên Reşoyê te ne” got û awirek di Sêdiq de firand.

Sarê keserek ji kezebê kişand:

”Ma qey de ew ê jî rojekê ji pişt wî deriyê teng derkeve. Reşo zilamekî ne sêle bû, lê Xwedê mala sersebeban xerab bike!...”
Wê jî xwest ku gotinê bîne ser Reyis û wî pîs bike.
Heso piştî ku bi keder lê nerî, bi haweyê xwe jî rê lê girt:
”Di wan salên ku telebeyên me li Nisêbînê şoreşa xwe qedandibûn û dest bi şoreşa van gundikên me kiribûn, ji min re digotin Apê Welatparêz ”
Civat hemû keniya. Çekdar jî. Circîs fêhm kir bê Heso
171
li ku derê dixîne, gotina xwe daqurtand.
”Erê lo, min bi şiklekî bi Pîra me da fêhmkirin bê ew welatparêzî çibû.”
Destê xwe bilind kir û li hev zîvirand:
”Îcar piştî ku ez hatim girtin, van telebeyên me li hepsê navê min kirin ‘Apê Şoreşger.’ Û yabo qurbano ji wê rojê û heta niha, hema hema her kêlî ez ji Pîrê re dibêjim ku şoreş û şoreşger du tiştên ji hev cihê ne, lê dîsa jî tev li hev dike...”
Neheqî lê dikir. Bi dû girtina wî de hilgirtin û ragirtina malê bi carekê ve ketibû stuyê Pîrê. Ling ne dixistin bin xwe. Liberxwedan û pevçûnê ew anîbû derexeke wilo ku bi qasî jina mîrekî hêviyan ji xwe bike. Xwe paqij digirt û sipehî li xwe dikir. Mîna Aydinê ku her tim bi qerewat bû, şahra botanî ji serî ne diket. Bi sariya sibehê re xwe kurmanckî diçikçikand; zivistan ba havîn ba, kiras û xeftan û libade ji ser xwe ne dikir.
Sarê pîrekeke kihêlî bû û di civatê de mercên kihêltiyê

jî hîn hebûn. Xwe ne kir wek wî. Beşişî û bi destê xwe tewirand:
”Di dema keç û xortaniya me de jî li dinyayê navê gelek tiştan tune bû, Heso. Ma ez ê bi vî emrê dawî çi û ne çi ezber bikim, Xwedê ji te raziyo...”
Baranê ku heyranê mêrxasiya Sarê bû, zor da xwe ku lê temaşe bike. Lê Xelef xwe xist taldeya wê. Ji mecbûrî wî jî dîq lê nerî. Serê wî ê zelût wek şebeşê ku di nav tertikan de mezin bûbû, ji devê deriyê odeyê telomelî xuya dikir.
”Apê Heso, tu jî baş dizanî ku dayika me Sarê, ji me tevan jî mêrxastir, jîr û zanatir e. Wek ku Reyis jî dibêje
172
‘ew sereka temamê dayikên Kurdistanê ye.‘ Dayê hestiyê pişta girtiyan bû. Di her liberxwedanên me de ji ber devê deriyê hepsê ne diqeliqî. Bi sedan jin û mêr li xwe dicivandin, bi çepik û lîle lîlan xwe berdidan nava sûka Diyarbekirê û ji bo me diqêriyan. Geh li ber kolordiyê benzîn bi ser xwe dadikir xwe dişewitand, geh bi komeke pîrek berê xwe dida Enqerê û li heqê me dipirsî. Bi qeweta wan mitîngên wê ên li Diyarbekirê bû ku xelkê bajêr bi carekê ve îro dest dane partiya me. Dayê Kurdistan bilind kir”, got û dîsa bêvila xwe paqij kir.
Her tim fişke fişka bêvila wî bû. Di girtîgehê de çavekî wî mîqrob girtibû û seraqet hêsir dikirin. Hêsiran xwe di qulikên bêvilê re berdidan. Lê wî ew yeka han bi bapêşê ve girêdabû.
Sarê bi gotina wî a dawî keniya. Gava ku dikeniya û bi

devlikenî dipeyivî jî pir şêrîn dibû. Lê ew dengê wê ê ku di guhên civatê de li hev vedigeriya û mêr pê kil dibûn, mîna çavên wê qels bûbû. Bi tirs bû. Ji ber bêbextiyeke nuh a telebeyên ku îro bûbûn çekdar û şer bi eskeran re dikirin, destê wê di nava wê de bû. Ji tirsan ew ruyê wê ê ku li şerabê çûbû û bi hinera salan xweş xemirîbû, di van kêlîkan de çilmisî bû. Ruyê vemirî hîç pê ne diket.
”Lawê min, wilehî ew cehda min ne ji bo partiya we û ne jî ji bo Kurdistanê bû; hîletê min ji partiya we û Reyisê we diçe. Hûn hemû jî mîna Reşokê min xort û naşî bûn û ketibûn pişt deriyekî teng. Eskeran zilm li we dikirin; dilê kafiran bi halê we dişewitî! Ma dibû ku ez bêdeng bimama?”
Heso berî mêhvanên xwe:
”Xwedê ji te raziyê, ma niha hewara van gotina ye”,
173
got û li Circîs nerî.
Circîs jî di bin simbêlan re dikeniya. Dixwest ku Sarê bidomîne. Ji guhên civatê ên bel xuya dikir ku civatê jî dixwest Sarê defterên kevin veke û her tiştî li ruyê wan xîne. Li gora wan herçiqasî Sarê pîrejineke serdest û zana xuya bikira jî, di dawiyê de dîsa pîrekek bû; vê pîrekê hin peyv biteriqandana û biajota ser çekdaran jî ewqasî xem ne dikir. Çekdar kurd bûn û di civata kurdên wek wan misilman de jî pîrek ”mexlûqeke ku Xwedê ew ji bo zewqa nav livînan xuliqandibû” û ”çiltûk û efara genim bû”, çi bigota jî divabû ew bidana xatirê pîrekiya wê. Baran mîna ku şîretkirîbû, tiştek li xwe çênekir. Heta

ku jê hat ruyê xwe geş kir û bi zimanekî beşişî got:
”Hema dayika me çi ji me re dibêje bila bibêje; heqê
wê ye. Di vî gundê welatparwer de bilasebeb gelek mêrên
hêja hatin kuştin. Niha ku ew kuştin û malwêrankirin li ser
tiştekî kurdistanî ba dîsa jî xem ne dikir. Li vî gundî û heta
li temamê vê birekê her tiştî bêyî Reyis rû da bû. Reyis
piştî ku bi rastiya meselê dihise dest datîne ser şer; lê hinekî
dereng dimîne. Ma wê çawa dereng ne maba, barê zir
welatekî li ser pişta wî bû û ew jî çawa ba insanek bû; wê
bi kê ji me daketa û daneketa! Wek ku dayê jî got, em
hemû xeşîm û naşî bûn, me bi tştekî nizanîbû û dewletê jî
nav partiya me tije ajanên wek Kenan Arikan û Şoreş kiribûn...”
Civat cefilî û devê wê bihustekê ji ser hev çû. Heso
keserek kişand. Mela Salar reşxeriqî, Sarê bi devê xwe
girt, Zibêr dengekî kuxuya. Kuxuka wî a ji mekrohî ji
çavên Mîrzo ne reviya.
Circîs xwe ne girt:
174
”Çawa yabo qurbano çawa?” got û guhên xwe bi ser
de miç kirin.
Mîna wî her kesî her tiştê xwe ji bîr kir û bi tenê hişê
xwe berda ser bê ka Reyis çi bi Kenan û Şoreş kiriye. Di
vê navê re jî Şewqedîn çayê digerand û li ber Qaso sekinîbû.
Qaso bêyî ku li tepsiyê binere, destê xwe dirêjî nav
qedehên çayê kir, destê wî kete hindurê qedehê. Destê wî
şewitî, lê dîsa jî xwe tevnelebitand. Sîrac dixwest tiştekî ji
Mihê bipirse. Mihê engûşkek avêtê, engûşk li xavika zikê
wî rast hat. Sîrac jî mîna ku ji kerê bikeve, ihînî pê ket û

xwe bi ser hev de guvaşt. Heger engûşk li devê wî keta, miheqeq wê diranek-duduyên wî bihatana xwarê.
”Reyis bûba hezar perçe dîsa jî wê nikarîba rê li ber berîberdaniya me a wan salan bigirta. Wî destê xwe diavêt aliyekî me ber digirt, li aliyê din di nav destê me de diteqiya. Karê wî mabû ku hema bi vir de û wir de bi me ve bibeziya û aqil bida me! Tew îro hîn bêhtir dibeze. Mezinahiya welatekî wek Kurdistanê ku her kesî kurdayetiya xwe ji bîr kiriye, ewqasî ne rehet e. Bi rastî jî karê Reyis pir pir giran û zor e! Ji aliyekî ve wê me hînî ilim, politîka û şer bike û ji aliyekî ve jî wê bi ajanên nav me bilebike. Û bi ser de jî him wê bi hişyarkirina gelê me dakeve; bi dengê xwe ji wan re kasetan dagire û destnivîsên xwe bişîne...”
Zibêr mîna ku di eyarê berêz de bû, bêhnçikyayî:
”Erê birazî we çi bi serê wan herdu ajanan kir”, got û tizbiya xwe zîzikand.
”Apo helbet mirov ajanan dikuje. Reyis herdu jî bi ecêbeke pîs dan kuştin. Hevalan Şoreş şewitand û serê Kenên jî bi çakûçan pelixandin.”
175
Sêdiq bi haweyekî dilsar li çekdaran nerî û destê xwe hejand:
”Howeh kuro, bê kê bîra ku Şoreş ajan be, dibir! Hela Kenan tirk bû ajantiya wî ser çavan, lê ma ne qaşo Şoreş ji me bû, kurd bû...”
Zibêrê birçiyê gotinê, berî Baran piştî ku bi ûjdanekî rehet got:

”Pêşiyên me bi derewan ne gotine ‘kurmê darê ne ji darê be dar kurmî nabe’, Sadiq de qey heq kiribûn lo” û pala xwe da zemberîşan.
Mela Salar gotina wî bi xwe ne xweş anî û bi zirt peyivî:
”Ez bi ezameta Xwedê sûnd dixwim, heger li vî gundî ajanekî qûnde hebe, ew bi xwe tu yî! Xwedê tu ji bo xezebê xuliqandî ye! Tu çawa dikarî kêfa xwe bi kuştina insên bînî, hey ekrût! Dema ku Şoreş mezinahî li ezbeta pizûriyan dikir, tu ji bin çengê wî ê rastê û destbirakê te Mihoyê murtud jî ji bin çengê wî ê çepê dernediket û we bi serê hev sund dixwar. Di dema Kenên de jî hûn dîsa ew şelaf û fisek bûn; we em xistibûn qaqa reş!...”
Da xwe ku civatê biterikîne, Sarê xwe zer kir destê wî. Destên herduyan jî ji kelecanê diricifîn. Sarê Mela sekinand, lê devê wî ne sekinand.
”Erê kuro, bê çi ji xwe fedî nake, bê çawa xwe li ber çavên mêhvanan belebanî dike. Ji bo ku têkeve çavên wan, dikare gotina herî bêmirês ji xwe û me hemiyan re jî bibêje! A te çavşahîkkirine Zibêr...”
Heso kenekî ji dil dikir:
”Yabo Mela, tu îro ji doh bêhtir dipeyive; wilo nabe.
Mela torî ye lê negirin. Ê herî zanayê wan Elîkê Betê bû û
176
wî jî bi tivinga kurmancî êrîşî ser top û metilyozên dewletê dikir. Tew îcar di destê Mela me de ne tiving, keleşkof û reşaşe hene. Bi telaq heger hûn zêde bidin ser coka wî, ew ê yekî ji me sax bernede.”
Bi gotinên wî helbet wê her kes bikeniya. Lê Mîrzo ji

her kesî bêhtir keniya. Mela jî mîna civatê piştî ku hinekî beşişî û xwêhdana eniya xwe bi pêşmalka Sarê paqij kir, guh da ser Baran.
”Helbet Seyda kuştina du ajanên ku ev herêm xerab kiribûn û xelkê me bi hev dabûn kuştin, naparêze. Lê ajan dibe çi dibe bila bibe, dîsa jî kuştina insên tiştekî ne xweş e. Seyda mirovekî xwedayî ye, gerek mirov lê negire û hirmetê ji fikra wî re bigre.”
Piştî ku bi lez çixareya xwe pêxist û aciziya xwe bi dixana wê re berda, li Circîs nerî û gotin bire cihê ku lê sekinîbû:
”Heger ji serî de her tişt li gora bîr û baweriyên Reyis bimeşiya, ne ev herêm xerab dibû û ne jî xelkê me ê vê heremê ewqasî ji partiyê sar dibû. Bi rastî jî Reyis tiştekî zêde zêde bi ajanên nav partiyê daket. Ajanan partî dorpêç kiribûn. Heger Reyis qeweta xwe hemû li wî alî serf ne kiriba, kî dizane belkî îro Kurdistan li ser destê wî azadkiribûya jî.
Zemên şanî me da ku di derbarê wan rêxistinên bêkêr de, Reyis çendî rast fikirîbû. Hemiyan gelê me li ser piştê hiştin û bi welatên Ewrupayê de reviyan. Bê nan û xwê derketin. Derew bi gelê me re kirin. Reyis...”
Kenêr jî bêhneke berê hatibû civatê. Dîsa di qûncika odeyê de rûniştibû; mêş ji ser xwe diqewirandin û bê his û pis lê guhdarî dikir. Lê bêyî ku lêvên xwe bilebitîne di
177
nava xwe de jî bi aqilê wî dikeniya. Vî mirovî ji girtîgehê tebihetekî pîs bi xwe re anîbû. Li der li hindur, mîna

mirîşkan her tim xwe li qûncikan digirt.
”Baran bibexişîne, dibe ku ez bi qasî te û hevalên te nizanibim; lê tiştên ku ez dizanim jî ez tam dizanim.
Ew çawa mezin e ku bêyî destûra wî bi meh û salan wê zilamên wî li herêma Rihayê, Batmanê û Mêrdînê şerekî dijwar li dar xînin! Di wan salan de ji destê feqîriya ku wî şerî bi serê me de anîbû, rewa di laşê me de ne mabû. Zarokên me bêhna goşt û tewaşê ji bîr kiribûn. We kevir li ser kevir ne hiştibû! Lêbelê ew çawa partî ye ku ewqas ajan dikaribin tê de cih bigirin û hilkişin cihên herî bilind!”
Her kesî dizanîbû ku Kenêr ne mîrovekî cahil bû, lê dîsa jî kortika qirika wî ji xwêhdanê şil bûbû. A ku bi eniyê ketibû hîn bêhtir bû. Ji çekdaran zêdetir li sîlehên wan dinerî û dipeyivî. Piştî ku kefa destê xwe ê rastê wek asfincê li ser kortika qirikê û eniya xwe bir û anî û ji xortan tasek av xwest, bêhnekê sekinî û bi haweyekî balkêş fikirî. Di vê kêlîkê de jî çekdaran hirmeta xwe bi bêdengiyê şanî wî didan û derwêşkî lê temaşe dikirin.
”Ji ber ku Reşo ji we veqetiyabû, we em hemû kiribûn ajan û we dijminahiyeke lewitî bi me re kir. Li Nisêbînê û Cizîrê barûte bûbûn şûrkêşên we. Maqûlek nema ku we di sûkan de erza wî ne şikenand. Kuro we heta bi ribabên mitirbên me şikenandin!...”
Damarên eniya Baranê qosarî bel bûbûn. Ji birhûyên wî ên qalind û reş ku bi jêr de kişiyabûn, rengê çavên wî xuya ne dikir; lê çavan dilîst. Bêhna xwe digirt û berdida. Di nava xwe de dikeliya. Car carê jî dev qurmê zimanê

xwe dikir. Lê Kenêr jî tu polê wî ne firandibû, ne derew û ne jî heqaret lê kiribû. Bi tenê jê re ta bi derziyê vekiribû, ewqas. Bi xwe hisiyabû ku divabû her tiştê xwe ên girîng berî hatina wî bigotana. Li girtîgehê ne wî û ne jî girtiyên hevalên wî, di mijarên siyasî de tu carî Kenêr qanih ne kiribûn. Vî gundiyê kone ji ber ku li her tiştî bi şik dinerî, pevgirêdana di navbera tişt û tiştan de jî zû didît û hema pê re fêhm dikir ku wê dawî çawa biqediya. Seroketiya telebeyan jê re wek bilûra ber bê dihat.

Heso nerehetiya Baran ferq kir. Devê xwe dagirt ku ber birîne bigire, lê Mela Salar hîn bêhtir birîna wî tevda:

”Ma çi û ne çi di serê vî miletî de ne kirin van telebeyan! Me nema dikarîbû em du gotinan bi jina xwe re bikin!”

Heso tiştê ku berî niha dixwest bigota got:

”Erê Mela, ev tu çîma niviştekê ji van mirîşkên me re çênakî, madem tu ewqasî alîm î? Ne em bin û ne ev ceyrana ku dewletê ji me re aniye. Ji destê vê ceyranê mirîşk tev de cinoyî bûne. Ro û şev tev li hev kirine; bi ro dilûsin û bi şev jî xwe berdidin ser sergoyan.”

Mîrzo da ber:

”Tew Apê Heso tew, îcar ên me elimîne bi şev hêkan dikin!”

Sarê jî xwe avêt nav hofka wan:

”Ê ne Heso, xwezî te ew şeva ku nuh me ceryan pêxist dîtibûya! Ecêbnedîno, ji kêfa ceyranê re heta sibehê xew ne bi çavê gundiyekî û ne jî bi ê heywaneke me ket. Ma ji

xwe tiştê ku van keran kirin, heta ro derketiye ziriyane!”
Hesûk jî bi qasî wan civat şa kir:
”Ma ji xwe kerekî me heye, empûl bi me ve ne hiştin.
179
Her şev ez ê du-sê empûlan li axo xim û ew ê jî here bikeritîne, yaho!”
Bedrên piştî ku got ”kuro qey empûlê dişibîne pirtiqalê”,
Sadiq peyivî:
”Ma ji xwe a ku bi serê Osoyê menderî de hatiye, qey wek a kerê û mirîşka ye. Mêro derdora mala xwe tije empûlên ku bi xwe hema li ser hev pêdikevin û vedimrin dike û bi ser de jî li ber devê deriyê xwe nobetê nagire. Erê kuro, mala xwe şibandiye kerxaneyê û dibêje ‘çima şivêrên tir û qemyonan her şev tên li deriyê min dixin?’ Ma lawo kerxane bê bekçî dibe?”
Zibêr jî gotin anî ser jina xwe:
”Gava ku ceyran tê gund, keça çavbelekê jî bi kêf û eşq dibêje ’cihê şûjina me jî çêbû, zarokino’ û şûjina xwe di qulîka pirîzê radike.”
Kêf û henekên civatê dîsa jî bêhna Baran fireh ne kiribû.
Lê jîr fikirî. Bi a dilê xwe ne kir. Bi fên rahişt Kenêr;
xwe kir hevalê wî û nikil avêtênê:
”Apê me ê Kenêr bi qasî alimekî mintehî zana ye; lê ji ber çavên alimên herî mezin jî carina hin tiştên piçûk dikarin winda bibin. Ew ji me çêtir dizane ku destpêka her tiştî pêşî bi qolinc dimeşe. Zarokek bi qasî xortekî û xortek jî bi qasî mezinekî nikare baş bifikire û tiştan ji hev bifesilîne. Ferx bi ribêt dibe ribat. Dema ku me dest bi doza

Kurdistana bav û kalan kiribû, em hemû jî hîna ferxên bê ribat bûn. Û bi ser de jî me ji sifrê dest pê kiribû. Bav û kalên me tu mîraseke netewî ji me re ne hiştibûn; tu asasên xelasiyê ji me re dananîbûn. Û Reyis jî tam di rewşeke wilo kambax de partiyekê ji efarê çêdike. Helbet wê her tişt li gora dilê wî nemeşiya. Reyis ji Lenîn ne mezin-
180
tir bû ku di partiya wî de jî bi sedan ajan hebûn. Lê di dawiyê de, Lenîn hêdî bi hêdî partiyê ji ajanan dike û bi ser dikeve. Piştî mirina wî, îcar bi heval Stalîn em pê dihisin ku tew birek ajan di komîta merkezî de cih girtine û wî Lenînê fîlozof jî ew ne dîtine. Apê me ê delal, tarîxa temamê partiyên sosyalîst hema hema wek hev bûne. Di vî warî de ez dikarim gelek nimûneyan bidim...”
Sêdiq ji dera han destê xwe hejand û gotina xwe a her carê got:
”Barano na na, tu nimûneyan nede, em hevalê şer in. Kî bi eskerên tirko re şer bike em hevalên wî ne û hew.”
Baran jî mîna Reşo û Serdêr di civata gundiyan de mezin bûbû. Lawê melayekî bû. Ji exlaqê gundiyan baş fêhm dikir û ewqasî jî zarxweş bû. Heta li gora wî ”xelk, mexlûqekî bêqîmet”bû; tu ferqa cahilekî û xelkê ji hev tune bû. Mirovê cahil di civata herî maqûl de dikarîbû tif bikira û di cih de jî tifa xwe bialasta; dikarîbû li ser pêyan destava xwe bikira, pîsiya xwe bikira qûç û bi keviran jî li ber veteqiliya. Zanayekî dikarîbû cahilek ”tî bibira ser avê û tî jî vegeranda.” Kê bizanibûya jê re xweş bikira wê xelkê bida dû wî. Û wî jî ev yeka han baş dizanîbû.

Baran pariyê xwe di sêniya dohnê Kenêr dakiribû û sênî ber bi xwe de kişandibû. Civat nerm kiribû. Divabû rê ne daba Kenêrê ku ji bo xeberdanê xwe dixwar. Û wilo jî kir. Bêyî ku şelûpelê li xwe çêke, pêşî tasek av xwest û hema pê re jî destê xwe avêt tûrikê xwe. Kasetek derxist û ber bi Sarê de rabû. Piştî ku got ”Reyis ev kaset ji te re şandiye” û kaset dirêjî destê wê kir, bi lez li cihê xwe vegeriya û dîsa destê xwe avêt hindurê tûrik. Ji bilî çend kesan her kes ecêbmayî mabû; her kesî dev li serê zimanê

181

xwe kiribû û bi haweyê ku Baran tiştek bida wan jî mîna zarokan li destê wî dinerîn. Lê piştî ku Baran sê seetên bêrîkan û qelemeke hibrînî ji nav kaxetê derxistin, qelem û seetek li ber xwe danî û herdu seetên din dan destê Heso û Circîs û got ”Reyis pir silavan li we dike, ev seet ji we re diyarî şandine” û rahişt seet û qelema li ser kulêv, kelecan giha boxaza qirikê û civat di cihê xwe de qelqilî.

Mela Salar bêyî ku tiştekî bibêje seet berda bêrîka xwe.

Lê Kenêr him ne girt û him bi ser de jî di bersiva Baran de nikil avêtin serokê wî:

”Reyis divabû ev qelem ne ji min re, ji Erol Efendî re şandibaya. Erol mirovekî mamoste bû; ji min çêtir dizanîbû deng û behs û rapor nivîsandiba û jê re şandibana.”

Zibêr bi wahc gotin ji devê wî girt:

”Pêşiyên me bi derewan ne gotine, ‘bi vê qûşê em ê nikaribin herin Mûşê.’ De ji dest bigire û dirêj neke!”

Baran li ber xwe ket, lê hema zû jî bi ser xwe ve hat.

Devê xwe dagirt û vekir, lê Circîsê ku di civatan de bi qasî

bûdîstekî bi sebir bû gotin di ber de hişt:
”Pêşiyên me ev jî gotine, ‘ê ku neke bi gotinên mezinan wê qiloçên wî bibin wek ên bizinan.’ Zibêr heger te ji serî de bi a me kiribaya, îro me ê ev diyarî û miyarî jî ne dîtibana.”
Dû re jî bi haweyekî maqûl diyariya ku girtibû li xwedî vegerand. Lê hîn di wê bêhntengiya xwe de bû, ji binya malan Cemîlê hûrî dîsa bi neviyên xwe ve dest bi talîma eskerî kiribû û mîna gardiyanên girtîgeha Diyarbekirê diqêriya.
”Lawo Hesûk, here cercûrekî di serê wî de vala bike; vî em rezîl kirin wilo nabe bavo!...”
182
Cemîl ji destê êşkenceya ku li girtîgeha Diyarbekirê dîtibû serçelqî bûbû. Gava ku gotineke bi tirkî diçû guhê wî, yekser radibû ser xwe û diket temenê. Carina jî bazdida êxur û xwe di bin alifê pez de vediziland. Ji roja ku ji girtîgehê derketibû her sibeh neviyên xwe li hev dicivandin, xwe dikir gardiyan, ew dikirin girtî û bi wan tibabekî dirêj talîm dikir. Îcar dema ku Sêdiq xwe eskerî girêdida û ber pê de dimeşiya, Cemîl tam ji ser xwe diçû, digiriya û xwe diavêt pişt gundiyan.
Mirov digot qey hevalekî Baran bêkêf bû; mîna kêzikê bi awirên xwe habela diçû vî alî û wî alî. Lêbelê ê din çavên xwe bi ser civatê de pêl kiribûn û ji kûr û dûr difikirî. Ev xort ji çend gotinên ku berî niha kiribûn, xuya dikir ku ne mirovekî xeşîm bû. Heta li gora Kenêr diruvê hiqûqzanekî jî pê diket.

Piştî ku Erol Efendî jî qelem ne girt, qelem û seet man li wê navê, Heso rahişt herduyan, li ber xwe danîn û bi zimanekî beşişî got:
”Di nav miletê me ê misilman de camêrî bi kêr nayê. Erê ma ne ji xwe, di wê tûgaya Mêrdîne û hepsa Diyarbekirê de, min ewqasî ji vî Circîsê me re got ku li ber xwe ne de û qet bi a min ne kir, kuro!”
Berê xwe guhert ser wî û dewam kir:
”Te li ber xwe da û min li ber xwe neda, wan çi got min qebûl kir û te jî qebûl ne kir. Di dawiyê de jî him mehkemeyê ez û tu wek hev ceze kirin û him jî telebeyan bi qasî cihê te wilo jî cih dan min.”
Circîs ji dil keniya. Kenê wî hare harî bû. Ji binya gund jî mirov dikarîbû dengê kenê wî bikira.
”Na na, bi telaq cihê te bi qasî minareyekê ji ê min
183
bilindtir bû. Tu çima nabêjî ku telebeyan qîmetekî mezin didan min. Li hepsê her tim tu di ser min re digirtin; her tim bi te dişêwirîn.”
Heso jî piştî ku got ”Circîs, bi wî şêxê erdê li Bexdayê tu rast dibêjî lo, lê çênedibû ku min bigota”, heyranê wî Kerîm peyivî:
”Apê me Heso baş fêhm kiriye ku pêşî divê mirov makyavelîst bifikire. Tiştê ku fêda mirov tê de tune be gerek mirov jê bireve.”
Kerîm ji girtiyan xwe fêrî gelek têgehên ku bi ”îzm” diqediyan kiribû. Lê di vî warî de kêmaniya wî a herî mezin ku têgeh, bê cih û wext bi kar dianîn. Û heta li himber

mirovên wek Hûto jî dîsa bi zimanekî wilo dipeyivî.
Li gora wî, telebeyan jî mîna wî kiribûn û ji ber wê yekê jî di nav gundiyan de zanyar hatibûn naskirin. Bi rastî jî heger ne ji çend kesên mîna Heso qerfok bana, gundiyan digel şêxitiya wî belkî ew ji xwe re wek ronakbîrekî mezin jî qebûl kiribana.
Baran û hevalên xwe di demeke ku zoravî û temamê xelkê herêmê hino hino bi ser xwe ve hatibûn, lêdan, kuştin, girtin û henekpêkirina ku eskeran bi gundiyan dikir rabûbû, dest bi şer kiribûn û xwe berdabûn gundan. Bi dû lêdan, girtin û kuştina sê-çar salan de her kes bêdeng sekinîbû û bi kar û barê xwe daketibû. Li herêmê maldarî hêdî bi hêdî li pêş ketibû. Dewletê elektirîk kişandibû hin gundên deşt û çiyê. Ji bilî vê li hin gundan ji bin erdê av derxistibû. Qatûf û cenbiyên stilîliyan ên bacanan, hejîr û tirî nema dihatin gundên ser keviya mayinan. Gundî bûbûn xwedî rez û bexçe û fêkiyê xwe ji malê dixwarin. Rêya Îpekê mîna gêrikê dixebitî. Gelek kesan qemyon û tir
184
kirîbûn; mal dikişandin Iraqê û ji wir jî bi xwe re mazod dianîn. Şifêran li herêmê bihayê mazotê bi carekê ve xistibûn. Xwedî erdan gîsin li ser gîsin li erdê xwe dixistin û habela çandinî dikirin. Deşta Nisêbînê heta ku dibû zivistan jî her tim bi şînahî bû.
Zorava gundekî ku li dor heşt hezar olçek erdê wê ê bejî hebû. Û hemû jî bi terektorê dihat ajotin. Li ser gotina Heso û Circîs lawên wan, bi şirîkayî li binya gund erd kolabûn û ji bin erdê av derxistibûn; av li malên xwe

gerandîbûn û di nav erdên derdora gund de bi kar anîbûn. Hawêrdora gund hemû jî kiribûn dar û ber. Bi saya ava bin erdê zoravî dilgeş bûbûn. Hevkariyê halxweşî û dostayî bi xwe re anîbû û ew bi hev şidandibûn. Her kom û komik bi tifaqê dikarîbû bigiha armanca xwe. Tifaq dijminê xizaniyê û dostê dewlemendiyê bû. Û dewlemendiyê jî berberî û fesadiya hindurê malê radikir. Mirovekî têr ji yekî birçî çêtir dikarîbû bifikiriya û serê xwe bi tiştên mezin biêşanda. Bi tifaqê mirov dikarîbû keleha herî asê bixista jî û raxista jî. Ji tifaqê bi hêztir li vê dinyayê tiştek tune bû. Erol Efendî her tim ji wan re wilo gotibû. Bi rastî jî zoraviyan ji tifaqê xêr û bereketeke mezin dîtibûn. Ji ber ku bi tifaqî diliviyan, bêyî ku bi xwe bizanibin, mejiyê wan jî li ser qenciyê çerx dikir. Rêya ku ji Îpekê vediqetiya û dihat gund, zift û qîr kiribûn û li ser bestê jî pirek çêkiribûn. Sarê bi qeweta pereyan qedexa ku dewletê danîbû ser mamostetiya Erol Efendî rakiribû; bi rêya axayê gundê Zêdiyê du sed hezar dabû komutanê tûgaya Mêrdînê û Erol li gund dîsa kiribû mamoste. Wekî din jî hemşîreyek li gund bi cih kiribûn. Sê-çar terektor qûm di nava gund de vala kiribûn û wan bi xwe ji zarokan re zirnazîq, hêlan û

185

hawe bi hawe gelek deydîk çêkiribûn. Erol Efendî bi gundiyan hewşên wan û navtarên gund mîna sûka Mêrdînê bi kevirên reqifandî raxistibû; gund ji rêx û pirik û heriyê paqij kiribû. Her kesî ji ser dîwarên hewşa xwe sênc rakiribû. Devê bîra binya gund bi têlên ristînî rapêçabûn. Bereteyên heywanên xwe dûrî gund diavêtin. ”Dermanên

kurmancî” nema bi kardianîn. Nexweşên xwe doktor bi doktor digerandin. Qelen jî rakiribûn. Mîna bajariyên Mêrdînê rê dabûn keç û lawan; wan xwe bi xwe hevdu dieciband û bi hev re dizewicîn. Dê û bavên bûkê jî mîna ên zavê dixesirîn.

Di eslê xwe de zoraviyan ne bi tenê xwe, gundiyên derdora xwe jî bi xwe re rakiribûn. Menderî û sarinciyan û herwekî din ew ji xwe re nimûne girtibûn û tevgeriyabûn. Baran girêka werîsê xwe bi pişt heçî xistibû; bi gotinên yekane ji gundiyan re bihar anîbû kabokê û civat mat kiribû. Xort û zarok hîn ji serî de bûbûn hevalên wî. Li gora dilê xortan peyivîbû; ji wan re xweş gotibû û serî li wan mezin kiribû. Ji pîrejinan re ”dayê”, ji ciwanan re ”xuşkê, bira” û ji zilamên navser re jî gotibû ”keko.” Hilfa zarokan jî bi şekir kişandibû ser xwe. Bi devjenga di derbarê Reyis de, temamê ilmê xwe bi kar anîbû û bi peyvên herî xweş civat bersivandibû. Di wê navê re jî dema ku hinekan bi devjengê zor dabûnê, wî jî mîna şêxê Tinatê, bi çend gotinên nermikî a xwe gotibû, bi hêdîka berê wan dabû kêş û dû re jî bi hemd ew gindirandibûn. Jîr bû. Û nezaniya civatê jî ew hîn jîrtir kiribû. Cesareta xwe a herî mezin ji wir stendibû. Kaseta ku Ryis ji Sarê re şandibû bi civatê dabû guhdarîkirin. Di kasetê de Reyis kuştin, eman û nemana herêmê û terqandina Reşo bi carekê ve xistibû

186

stuyê Kenan Arikan û Şoreş; ew wek ajanên dewletê dîtibûn û bi rengekî barbarane ew dabûn kuştin. Herwiha têkiliyên xwe jî bi Reşo re danîbûn û Reşo dîsa kiribû

hevalê xwe.
Civat û bi taybetî jî Sarê bi kuştina Kenên, bi qasî ku bifiriyana kêfxweş bûbûn. Heta li tara jêr hin pîrekan dilîlandin û bêyî destûra mêrên xwe jî dîlan girtibûn. Reyis li ser navê partiyê lêborîna xwe ji temamê gundiyan xwestibû; dest û lingên Sarê maçî kiribûn û doza dueyan lê kiribû. Di dawiya kasetê de jî pir li ber geriyabû ku xwe berda binya xetê ba wî. Sarê jî di dilê xwe de her pê keniyabû, henekên xwe bi aqilê wî kiribû û geft lê xwaribûn. Zoraviyan pereyekî mezin wek bertîlê dabûn midîrê ”Devlet Su Îşlerî” û ”Devlet Karayollari Genelmudurlugu” û di nav erdê xwe de bîr kolabûn û rêya gundê xwe çêkiribûn. Lê Baran ew yeka ha jî bi şerê xwe ve girêdabû. Li gora wî, dewletê her tişt bi zanatî kiribû. Ji bo ku gundî nebana hevalên wan, elektirîk kişandibûn gundan, bîr kolabûn û rêyên wan çêkiribûn. Heger Baran kişandina elektirîkê jî bi şerê xwe ve girênedaba, dibû ku heta bi konebazên wek Kenêr jî qanih bûbana û bidana dû wî. Lê temamê zoraviyan baş dizanîbûn ku dewletê hîn di sala 1979an de, gelek gundên dorberî Qosarê kiribûn bi elektirîk.
187
BEŞÊ NEHAN
1
Tîrêjên roka danê sibehê di ser qesra Hisênê Axê re kişiyabûn Zorava û li Sarincê di mendera Birehîmê Qaso de çirûskan vedidan. Bayê seherê hîn jî ne şikestibû. Dengê canbêzaran, xweşkêş û navtêdanên lawên bavan, bi lîle lîlên zeriyên bûblaniyan re bûbûn yek û di pesarên çiyayên

Omeriya de li hev vedigeriyan. Zivingê dihejiya.
Hatxê di nav rivînan de mabû. Dixan ji Bezekê bilind
dibû. Esker li dora Bamidê û Cibiltînê bûbûn xelek. Metilyozan
hawêrdor agir dipijiqandin. Bi erdê re ezman jî
dişewitî. Helîkopter mîna stêran bi vir de û wir de dixijiqîn.
Mirov digot qey birûsk diavêtin, her derê di nava
şewatê de kêferatê dikir. Teyr û tilûran ji zû de xeta mayinan
derbas kiribûn. Qîr û hewar û halan bû! Hin pîrek
digriyan û bi tepan raserî xwe bûbûn; hinan tirsa xwe bi
gotinên mêrxasan vedişartin û xwe bi cesaret didan xuyakirin;
lê hemû jî ketibûn taya ku gelo lawê wê jî ne di nav
vî şerî de bû?
Şerê ku di zivistana sala 1987an de dîsa li derdora van
gundan derketibû, ji ê niha jî dijwartir bû. Di wî şerî de
nozdeh çekdar û ewqase esker û tîm jî hatibûn kuştin.
Çekdaran mêraniyeke mezin kiribûn; ji danê nîvro û heta
danê êvarê bêwestan li ber xwe dabûn û yek jî ne reviyabû.
Çend kesan ji wan bi mebesta ku hêsîr nekevin, bombe
jî bi xwe de teqandibûn. Eskeran termên wan teslîmî belediya
Nisêbînê kiribûn û li mezelê Hecacan veşartibûn. Di
wî şerî de lawê Sêdiq ê duduyan jî hatibû kuştin. Lawê
188
Erol Efendî Alan bombe bi xwe de teqandibû; dêya wî bi
zor ew nas kiribû.
Zoravî li navtara gund gihabûn hev. Heso dilezand û
ber bi mala xwe de diçû. Zibêr dabû dû. Circîs jî dabû dû
wî. Çavên qefla zilaman hemiyan jî li ser wan bû. Wan jî
xwe li odeyê girt.

”Qîma min nayê ku hûn xwe ji gund berdin û wilo heşkere heşkere têkevin nav şer!”
Tajdînê ku ji bo çend hevteyekî bûbû komutanê herêmê, bi haweyekî kubar got:
”Apê Heso, em mirov in şervan in. Me ji bo şer û pevçûnê rahiştiye van sîlehan. Hevalên me di şer de tên kuştin. Ma dibe ku em nerin bi hewara wan ve? Ez hêvî dikim tu min fêhm bikî.”
Heso carekê xistibû serê xwe ku wî çawa bigota jî ew ê qanih nebûya. Dengê xwe hilda û bi qahr peyivî:
”Ez qebûl nakim! Dar û devî, kevîr û ax her der esker dikele! Qey hûn dixwazin esker vî gundî bişewitînin? Ji Xwedê bitirsin ji Xwedê!”
Piştî ku destê xwe ber bi koma zarokan de gerand, ”ma dilê we bi van zarokan jî naşewite?” Circîs xwe avêt nav:
”Ez jî qebûl nakim. A we ne xelaskirin, têkbirin e. Ma qey ava reş bi çavên we de hatiye, ma hûn nabînin bê ji erd û ezmên çawa agir dibare? Li cihê xwe rûnin, hûn ê bi xwe re me hemiyan jî bidin kuştin...”
Piştî ku Zibêr, Kenêr û temamê koma zilaman jî wek van got, Tajdînê torî sist bû. Lê hîn deqîqeyek ne ketibû wê navê, dîsa deng bi bêtêla wî ket. Tajdîn bi bazdan derbasî odeyê bû û derî li xwe girt. Çûn û hatina wî hemû jî deqîqeyek ne girt; wek gule ji hindur firiya, ”hevalino
189
bidin dû min”, got û bêhnçikyayî berê xwe dan qelêç.
Bi derketina wan re eskerên ku di Qesrikê û di besta ziyaretê de kemîn danîbûn, yekser li gund girêdan. Gelek

bûn. Zare zar bi zarokan ket, pîrekan kirin qîje wîj û her kes bazdan hinduran. Herhevt çekdar bi xwe re ne gihan ku biteqînin jî; hîn ne gihabûn binya rez, yek bi yek ketin û li wê navê bi ser birînên xwe de gevizîn. Xortekî ji wan agir bi kezeba mirov dixist; ne dixwest bimra. Ji gund jî gule li çend zarokan ketibûn. Dudu ji wan di cih de miribûn. Eskeran tibabê nîv seetê bêwestan li gund reşandin. Dû re jî ji hêla çiyê mîna gêrikê kişiyan û xwe dadan malan. Di wê navê re jî hinekan ji Dêrê mirêk diavêtin Zorava û Menderê. Heso bi wê yekê dîn û har bûbû. Di nav lepên eskeran de qîjwîja wî bû:

”Ma em li dawetê ne ku ev kûçikbavên dêriyan mirêk bi dest qu...ê jina xwe girtine û ha ha diavêjin vir û wir!...”

Di vê carê de esker û tîmên tûgaya Mêrdînê mîna demên rabihurî bi wan re ne kirin. Piçûk û mezin, mêr û jin hemû dan ber devê qezetoreyan û ew li ser bênderan civandin. Wek ku Kenêr jî digot, heger ji serî de bi vî haweyê niha bi wan re kiribana, belkî wan jî rê ne daba ku çekdaran di gundan de esker kuştibana. Li hin gundên Omeriya û Torê çekdar û esker çend carekî ketibûn pêxêla hev û ji herdu aliyan jî mêr ketibûn. Eskeran hin zilam pir êşandibûn û hin jî girtibûn. Gundî yekser ne dabûn ber xwe û bi pîrekan, keç û xortan jî daneketibûn. Roja ku çekdaran ro li nîvro ji Hatxê bi arpiciyan li cemseyeke eskerên Stilîlê girêdabûn û cemse şewitandibûn, gundî behetî mabûn ku eskeran jî çawa gundê wan ne şewitandi-

190

ye. Yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê hatibû gund, bi tenê çend

kes girtibûn û bi ser de jî ji wan re gotibû:
”Bibin hevalên Reyis, derkevin çiyê û bi me re şer bikin. Lê vê jî ji bîra nekin, hûn ê di rojekê de li me poşman bibin. Ji gund bernedin terempêlên me û li gund eskerên me nekujin. Binere qîma me nayê...”
Haydar bînbaşî piştî ku her kes bi lêdaneke pîs ji malan derxist ser bênderên rêya Dêrê, keç û jin şandin mal û bê pirs û bersiv bêhnekê dîsa li hemiyan xist, bi guhê Heso girt:
”Qûnvirik, ez dibînim tu gelekî mêr bûyî, ha! Te dest bi terorîstiyê kiriye û bi terorîstan re tu êrîşa xwe tîne ser eskerên dewletê. Tu ê dewleteke kurdî çêbikî...”
Hişê Heso ji Haydar bêhtir li ser cemseyê bû; bi xezeb di navtarên gund de diçû û dihat. Bi rastî jî şifêrê wê bi haweyê ku filîm dikişand bêserî diajot. Mirov digot qey xwîn rijiyabû çavên wî, ji dil û can şer dixwest. Hin pîrekên wek Sarê ji wan hatibûn bêvilê, dikarîbûn çend fîşek li ser kiribana û çira xwe bi carekê ve bitefandana. Li Xirbê Miraran jî şifêrekî mîna ê niha kiribû û çekdarekî jî ji hindurê malê lê girêdabû. Çar esker hatibûn kuştin. Lê ewan jî temamê gund dabûn ber devê top û metilyozan û piçûk-mezin tenterûs sax bernedabûn. Di vê carê de jinên zoraviyan jî mîna mêrên xwe ji desthilanîn ketibûn û bi zarokên xwe ve deriyê malê li ser xwe xiliqandibûn.
”Lo paşayê min lo, em li ku û dewletçêkirin li ku! Ma tu wî diruvî di me de dibînî?”
Di vê navê re jî eskeran termên çekdaran bi dû xwe de dikişkişandin û ew di nav koma zilaman de vedizilandin.

Dudu ji wan birîndar bûn. Herdu jî bîst salî dihatin. Ji
191
Rihayê bûn. Li Enqerê unîversîte dixwendin. Di sala çûyî de beşdarî nav çekdaran bûbûn. Yekî jê bêwestan him nav di hevalê xwe dida û him jî xeberên pîs bi eskeran re dikir. Heso destê xwe ber bi xortê ku ji mêranî ketibû û habela efwa xwe ji Haydar bînbaşî dixwest vekir û gotina xwe dewam kir:
”Tu jî baş dizanî ku bi van cahilk û mahilkan tu dewlet çênabe qomandarê min.”
Komutên guhê wî berda. Lê vê carê jî tiliya xwe a işaretê wek şûjinê di gwîzeka qirika wî de rakir:
”Rast bipeyive gapîr rast! Hûn ji dînê xwe bêhtir baweriyê bi van cahilk û mahilkan û Reyis tînin. Lê çima hûn dernakevin çiyê? Ma hûn bênamûs in qey?”
”Erê em bênamûs in. Heger em bi namûs bana, te ê nikarîba ev zilm li me kiribaya?”
Peyva wî bi xwe ne xweş anî. Tepek li nav serê wî xist. Dû re jî ber bi Bedrên de meşiya:
”Muxtarê Kurdistanê, tu jî ha!” got û bi kulm û pehînan ew da ber hev.
”Qomandarê min, ez di bextê te û jina te de bes li min xîne. Bavo bi wê sûnda herî mezin para min a Kurdistanê hemû ji te re û bes li min bide, yaho! Heger tu bawer nakî, heydê em herin nûtêrê ku ez para xwe li ser te tapo bikim. Bes e, bes e, te ez kuştim!”
Xortê ku meydan ji mirinê re dixwest gazî komutên kir:

”Bêşeref, berê xwe bide min!”
Komutên bi qahr piştî ku got ”toqê di çîmê ê din re derbas bikin!” dev ji Bedrên berda; li Circîs nerî û li ser hev serpozka potîna xwe li qîpikên lingên wî xistin. Circîs
192
şewişî û ket. Lê bi lez jî rabû.
”Tu ê Serdêr ji Ewrupayê rêyî çiyan bikî, ha!..”
Circîs veciniqî! Lê ewqasî jî ecêbmayî nema. Bi tenê ruyê wî hinekî vemirî. Ji zû de niqutîbû dilê wî ku di rojekê de wê Serdarê wî jî bigiha çekdaran.
”Na begê min, tu şaş î. Temamê serekên dewletê jî pê dizanin ku xortên gundê me bi Serdêr re bazdane Ewrupayê û li wir bi cih û war bûne. Çend zarokên ku ji vî gundî hatibûn kuştin jî, bêyî dê û bavên xwe gihabûn şervanan.”
Çekdaran ji gundiyan re gelek caran behs kiribûn ku esker bi toqên hesinî serê hevalên wan ên hêsîr difirînin, guh, bêvil, kîr û gunên wan jê dikin, çavên wan dixerimînin û daran di destava birîndar û kuştiyan de dikutin. Bi gundiyan ecêb ne hatibû. Lê dîsa jî dîtin û gotin ne dibû wek hev. Ev cara pêşî bû ku eskeran li ber çavên gundiyan çekdar rast derxistibûn û asaqên mezin di serê wan de kiribûn. Behetî mabûn! Dinya li ber çavên wan reşxeriqî bû. Hêsir têkilî hev bûbûn û xwe bi nav laşê wan de berdabû. Komutên dîsa li herdu birîndaran nerî. Xortê ku toq xistibûn çîmê wî, dizanîbû ku wê hema bêhneke din çi bi serê wî bihata. Hewar hewarên wî di felekan re derdiket. Di dawiyê de tiştê ku li bendîbû qewimî. Komutên piştî ku ji koma zilaman re got, ”ez ê rojekê wilo li we hemiyan jî

bikim”, çav da ê esker û ji nişkê ve bi wê navê de xwîn pijiqî. Toqa manyetîkî, kaboka Serkanê rihayî di nêvî re avêtibû. Di vê gava ku Serkan mîna çûkekî serjêkirî di cihê xwe de diperpitî, hevalê wî jî tif dikir komutên û jê re digot:

193

”Bêşeref, wê toqê têxe stuyê min û ji xwe re li mêrxasiya kurdan binere!”

Mela Salar xwe ne girt. Mîna pilingekî çeng bû:

”Heger tu bi wê toqê çîmên min jî nefirînî, tu deyûz bî!” got û şiqamek avêt komutên. Şiqamê cihê xwe girtibû. Haydar bînbaşî xîpekî zilaman û xwedî qilafetekî bi fesal bû. Çavgirover û çavreş jî bû. Ji bilî Hûto û Luqmên hemiyan jî li ber wî wek lepekî xuya dikir. Bi destekî Salar bilind kir û ew wek kevirê qewetê avêt. Sê-çar gavan dûr çû. Esker bi qezetoreyan kişiyan ser. Lê wî ne hişt. Bi lingê xwe ê rastê pê li sênga Salar kir û xwe bi ser de tewand:

”Bêhna xwe fireh bike mela qûnde; ê ne ez ê bînim bîra te. Ez te nakujim, ez ê te bi wan bidim kuştin. Lê hîn zû ye.”

Berê xwe da gundiyan û dewam kir:

”Mereqan nekin; ez ê bi ecêbên hîn ji vê mezintir we bikujim. Heta ku ez li pêş çavên we baz nedim ser dê û jinên we, ma ez we dikujim! Ez ê hino hino we biqedînim, kûçik lawên kûçikan!”

Dû re jî gazî eskerên xwe kir:

”Pêşî di devê wî de bimîzin. Dû re jî wî şilfîtazî bikin

û ji newqê û berjêr de tam deh deqîqeyan bi daran lêxînin”, got û vegeriya ba Heso.
Sê esker bi nav gund ketin. Ji hin hewşan qeflek hejik anîn û bi hejan raserî Mela hatin. Bi rastî jî wek gotina xwe derket. Wan çiqasî lê xist wî jî ewqasî li ber xwe da. Lê hîn çar-pênc deqîqeyên wî ne qediyabûn, di nav destê wan de xiliya. Ew bêhiş li erdê veziliyabû û eskeran hîn jî
194
lê dixistin.
Di eslê xwe de zoraviyên ku bi nav salan de çûbûn ne li bendî bobelateke wilo bûn. Hemiyan jî ji Haydar hêviya şîretan kiribûn. Cêhilan dabûn dû aqilê çekdaran, ”dewlet pilingekî ji qertonê, hêzeke kufikî”, dîtibûn û bawerî bi şerê wan anîbûn. Dê û bavên xwe bêminet kiribûn; dev ji xwendinê, kar û barê malê, çûna eskeriyê û zewacê berdabûn. Divabû aqilmendekî dewletê çend gotinên di cih de ji xortên wan re gotibana. Ew bi haweyekî razî kiribana. Tam wextê wê bû. Haydar bi zimanekî xweş dikarîbû xort di bin giraniya barê dewletê biperçiqandana. Heso wilo xwestibû.
”Ji dêvla zarokên xwe ve, hûn çima bi çol û çiyan nakevin? Hûn miletekî şervan in. Bi ser de jî we hemiyan eskerî kiriye. Hûn tivingê baş dizanin bi kar bînin. Ma ne wilo ye Heso axa?”
Hişê Heso bi carekê ve çûbû ser çekdarê ku geft li komutên dixwarin.
”Paşayê min, vî xortî nekuje û tu çi ji min bixwazî ez ê bikim. Cahil e lê negire.”

Heso wê ji ber temamê malê xwe derketiba. Heta heger komutên xerabiya herî mezin daba ber, ew jî dikarûbû bikira. Li mêraniya Keyoyê ku dev li birîna xwe dikir û li himberî komutên xwîna xwe wek tifê bi kar dianî ecêbmayî mabû. Ne bi tenê ew, tev li eskeran her kes jî. Gelek fêris dîtibûn. Lê bi fêrisiya xwe yek jî ne gihabû toza vî.
Komutên piştî ku pehînek li zikê Heso xist:
”Lawê min esker, toqê têxin stuyê wî kûçik î”, got û mîna dîkê elokan li wê navê çû û hat û dîsa xeberên pîs bi gundiyan re kirin.
195
Keyo jî wek xuya ku tu biavêjî nav êgir diteqiya:
”Bijî kurd û Kurdistan! Bijî şerê me! Bijî mêrxasî! Bijî Reyis! Bimire qehbetiya tirko!”
Circîs li ser çarlepikan meşiya û xwe avêt lingên komutên:
”Begê min, ez di bextê namûsa te de vî lawikî nekuje. Xort e xwe neke wek wî!”
Sura bayê sibehê bi dengê şerepnalan ji zû de şikestibû. Lê bêhna barûdê hîn jî ji erdê ranebûbû. Lêvên gul û kulîlkan bi carekê ve çiriyabûn. Pel ji daran hatibûn xwarê. Darên kevnar qelişîbûn. Tayik ji kokê de hatibûn birîn. Rokê jî serê xwe hildabû û mîna padîşahekî li dinyayê temaşe dikir. Tîrêjên wê ên zêrînî xwe berdabûn ser ruyê çiya û zinaran, dar û ber û şînahiyan û kelaxên zîvar zîvarî. Di cokên xwînê de zembelîlkên ku bûbûn zerazeng, bi ser bênderên Zorava de çilmisî diherikîn û ji nişkê ve yek bi yek winda dibûn.

Pêşî eskeran bi hev re destek fîşek berdan. Zoravî behetîn. Dû re jî cendekekî ku wek bîstanekî şên bû, bêserî lebitî û li erdê veziliya. Mîna ku dixwest hîn jî bigota, devê wî vekirîbû. Barînî bi Kerîm ket. Eskeran xwe avêtin ser. Hûto reviya. Li ber veteqilîn lê komutên ne hişt ku berdênê. Kabokên Hemo dafisiyan, bê keys rûnişt û bi serê xwe girt. Ew jî giriya. Xelef ji tirsan ziwa bûbû; lê Zibêr, Cemşît û Remo nav şeqên xwe şil kiribûn.
Heso serê Keyo xist ber sênga xwe û bi ser de kumişî.
Û Circîs jî çakêtê xwe avêt ser kelaxê wî. Çelq li zoraviyan ket. Eskeran cardin destek fîşek bi ezmên de berdan û li ser hev gotin:
”Xwe biavêjin erdê!...”
196
Her kesî xwe li erdê veziland. Lê Erol Efendî rabû ser xwe; dengê xwe bilind kir û bi hêrs gotina ku hîç ne dixwest bigota got:
”Ez ji xwe fedî dikim ku ez tirk im! Lê ji bîr neke ey komutanê kafir, ev miletê belengaz wê rojekê jîr û zana bibe û devê we biçirîne!”
Komutên wek pilingekî xwe çeng kir ser:
”Tu jî ha, tu jî ha!” got û serikê potîna xwe xist devê wî.
Diranên wî ên pêşî pê re weşiyan. Heger bi wî haweyî deqîqeyeke din bidomanda, Erol ji xwînê dikarîbû bifetisiya. Qaşo mamosteyê dewletê bû. Dewletê ne dawî li mamostetiya wî dianî û ne jî lêdan ji ser radikir. Eskeran tiştê ku bi gundiyan dikir bi wî jî dikirin. Hata carina a wî

pariyekî zêdetir jî dibû. Lê ew jî ne hindik bû, têra xwe hebû. Sînanê ku li Swêdê bi kurdayetiyê daketibû, gramera kurdî bi swêdiyekî re jê re şandibû û wî jî di dibistana dewletê de bi dizî zarok hînî nivîsandina kurdî dikirin. Haydar bînbaşî piştî ku bi pehîn û qûndaxên G3an parsuyên gelek kesan şikenandin, li pêpîka xwe xist. Esker li hev civiyan û rêz girtin. Dû re jî emir da ku yek bi yek tif gundiyan bikin û li terempêlên xwe siwarên. Wilo kirin. Hîn deng bi terempêlan ne ketibû, wî demaçeya xwe tazî xist destê xwe û got:

”Ez ê van mîqrobên ku min dane kuştin ji we re bihêlim û kesekî ji we jî negirim; îcar ku piçek namûsa we mabe, hûn ê jî rahijin sîlehên xwe û derkevin çiyê! Ez di dê û jinên we hemiyan... Û bi xatirê we!”

197

2

Bi çûna eskeran re zoravî mîna kulmozê ji malên xwe der bûn û bi ser bênderan de beziyan. Mîna keç û xortan, jinan jî guh ne dan tu kesî û bêmefer xwe avêtin ser termên perçekirî. Hewar hewara wan di felekan re derdiket! Hêsirên çavan mîna ava kaniyan bi ser xwîna kuştiyan de dihatin xwarê. Diavêtin ser xortaniya wan û bi dilşewatî dûrik digotin. Hinekan porê xwe kur dikirin, radikirin, bi keviran li sênga xwe dixistin û mîna teban berzûrî Xwedê dibûn. Bi nifiran re dixwestin gilî û gazinên xwe bikin. Lê wê gilî û gazinên xwe ji kê û bi kê bikirana?

Leme lema devê Heso bû. Bêhna kuştiyan ketibû laşê wî, dilê wî diaxivî û her ji bêhnikekê elq dihatênê. Rê ne

dibir ser tiştekî. Nizanîbû bê çi digot. Bi ser de jî tavê li serê wî xistibû. Çermê qoqê serî mîna dîwarê tenûrê qemirîbû. Guhekî wî ji dûr ve wek sersotekî xuya dikir. Taximên diranan ji dev herikîbûn wê navê. Ser çavên wî bi carekê ve di xwînê de mabûn. Dilopên xwînê ji herdu zendikan jî dinuqitîn. Sola lingê wî ê çepê li ber şeg û pegan çûbû. Ruyê xwe dabû ber ê Keyo, porê wî bi tiliyên xwe şeh dikir û digot:

”Temamê textorên dinyayê li vir bicivînin bê vî hefadê mêran bi ruh nekin. Tirba min jî li ba a wî ve bikolin. Û qubekê jî jê re lêkin. Kêlên wî ji mermerê çêkin. Dora tirbê hemî bikin bi dar û ber...”

Bînbaşî termên neh çekdarên ku li çiyê kuştibûn jî avêtibûn pişta gund. Zoraviyan ew jî anîbûn ba ên din û tev de li ser doşekan vezilandibûn. Eskeran termên van ji ên din jî xerabtir kiribûn. Hin ji wan ji êgir bûbûn qirik.

198

Ne dihatin naskirin. Mîna zoraviyan wilo bi serê cibiltînyan de jî kiribûn. Yuzbaşiyê Nisêbînê li Cibiltînê di hindurê malekê de pênc çekdar kuştibûn û termên wan jî li pêş çavên gundiyan tîş tîşî kiribûn. Bi çekdaran re xwediyê malê û sê zarokên xwe jî hatibûn kuştin. Gundî derxistibûn ser bênderan, li wan siwar hatibûn û hawe bi hawe asaqên mezin di wan de kiribûn.

Xeberguhêzan xebera nexêrê zû gihandibûn Zorava. Keça Sêdiq a çardeh salî di şerê ku çend roj berê li çiyê derketibû, birîndar hatibû girtin û ji desthilanîn ketibû. Keçik bûbû sebebê kuştina çekdaran. Wilo digotin. Li

hevalên xwe mikur hatibû û esker anîbûn ser wan. Ji bilî wê bi eskeran re li hin gundan jî geriyabû û hin kes dabûn girtin. Di eslê xwe de tiştekî ku eskeran nizanîba ji xwe tune bû. Çekdaran her tiştê xwe heşkere dikirin. Di destpêkê de bi şev tevdigeriyan û bi tedbîr gavên xwe diavêtin. Lê piştî ku di nav xelkê de hin bi hin cih girtin, li wê gorê jî hêdî bi hêdî şev qelaştin, li xwe kirin ronayî û piraniya karên xwe bi roj meşandin. Ro li nîvro xwe berdidan gundan. Gera bi rojê hema hema bûbû prensîpekî wan. Hewayî sîleh berdidan. Li çiyê serbest digeriyan û bi ser de jî agir dikirin. Carina jî li gundan xwe ji ber eskeran venedişartin. Heta serekê mifreza çekdarên Xerêb, bi şev elektirîka xwe a pênc pîlî pê dixist û ji vî gundî diçû gundê din. Bi wî haweyî şevekê jî xwestibû bigire ser qereqola Stilîlê. Cendirmeyên ku di sirta çiyê de qereqol diparastin, li wan girêdabûn û sê kes ji wan kuştibûn.

Di hikmê seetekê de, ên ku peya û ên ku bi terempêlan ji derûdor bi sedan kes li Zorava vehewiyan. Qor bi qor hîn jî dihatin. Piştî qelebalixeke mezin, ji navtara gund

199

Sarê û Perîxanê bi hev re lîlandin:

”Berxê nêr ji kêrê re ye”, gotin û bi navtêdanan li wê navê çûn û hatin.

Weş li mêran ket, porê serê wan mîna perên sîxuran gij bûn, rehên mêraniyê di eniya wan de bel bûn û ji kîn û buxzê kefincê di devê wan re avêt. Hema wilo, pîrekan jî bi carekê ve term ji zilaman re berdan, xwe li Sarê û Perîxanê girtin û wan jî dest bi lîlandinê kirin. Zorava

hejiya. Tam di vê bêhnika ku bi pîrekan cesareta kurmanciya
kevin derketibû pêş, mêrxasên civatê yek bi yek ji
komê vediqetiyan û xwe li hev digirtin, çend keçên ku
alîgirên çekdaran bûn teyb anîn û li ber dûrikên partîzanî
dest bi reqsê, govend û çepikan kirin. Bi lepta wan re bayê
mêraniyê jî di qîtikên lingên mêrkujan de geriya, rehên
stuyê wan sist bû, li ber xwe nerîn û hêdî bi hêdî xûz bûn.
Ji bo wan ev tiştekî nuh bû. Li ber serê kuştiyan reqs,
govend û çepik bêrêziyeke mezin bû. Heger bi haweyê
lîlandin û navtêdanan bimeşiya, wê zir komê, ji bilî ku
hema hema her kes di dilê xwe de bûbû hevalbendê çekdaran,
belkî êrîş bibirana ser qereqolên hidûd jî.
Circîs xwe ne girt, hilkişiya ser hewdê pez û bi hêrs
destê xwe hejand:
”Ma ew daweta kîjan dêlikê ji we ye? Ew keça kîjan
qewadî ye ku wê bi qomandarê tirko re bizewice, lêêê!”
Ji bilî hin keç û xortan xeberên wî li hesabê her kesî
hat. Teyb girtin. Vê carê jî mîna sêwiyan xwe dan ber
dîwaran û dîsa dest bi girî kirin. Sarê hatibû nav zilaman;
xwe dabû kêleka Mela Ehmedê omerî û bi gotinên pêşiyan
dilê wî xweş dikir. Mela bi ser lawê xwe de tiştekî zêde
dikaliya. Ji guleyên ku lawik kiribûn wek seradê, xuya
200
dikir ku bi mirîtî lê reşandibûn. Mela ji pîrekan jî bêhtir bi
dilşewatî diavêt ser:
”Lo lo xorto, de ka rabe ser xwe û ji min re bibêje bê
ez wê dergîstiya te bidim kê? Te çira mala min tefand, te
agir bi kezaba bavê xwe danî lawo!...”

Devê xwe xistibû ruyê wî, ”hîn bêhna zarokiyê jê tê;
çawa destê wan li te geriya”, digot û digiriya.
Rengê kuştina çekdaran, tesîreke mezin li ser Miradê
dêrî kiribû. Lawê wî qet qetî kiribûn. Ne digiriya lê mîna
hirçekî birîndar li wê navê diçû û dihat û bêser û ber kufirî
dikirin. Di dawiyê de xwe çeng kir kevirekî; kevir di
pişta Sadiq de wer kir û got:
”Heger ne ji wê qehbika qîza te baya, evqas xort jî ne
dihatin kuştin. Te qîza xwe wek muxbirekê şand nav şervanan.
Tu ajan î!”
Sadiq dîn û har bû û ber bi malê de beziya. Qesda
demaçeya xwe kiribû, lê gundiyan ew di cih de zeft kirin.
Piştî ku çend kesan xwe dan dora Mirêd û ew jî wek wî
çort peyivîn, gurînî bi koma zilaman ket; Mirad û hevalên
wî dan ber sênga xwe û ew ji gund bi dûr xistin.
Di eslê xwe de heger komutanê Reyis ê herêmê bi dizî
li dijî Sêdiq nepeyiviya, belkî ev nexweşiya berî niha jî
derneketibûya. Çekdar ketibûn bin aqilê keça wî, dilê wê
bi evîndariyeke welatî tije kiribûn û ew bi xwe re rakiribûn
çiyê. Sêdiq û heta temamê gundiyan jî çûna wê bi xwe
ne xweş anîbûn. Li gora wan, keçik tirtikî bû û bi ser de jî
hîn piçûk bû. Qederê hevteyekê dabû dû komutanê Reyis
ku wî qanih bike û keça xwe vegerîne malê. Komutan li
gundekî Torê tap kiribû. Komutan ne hatibû rayê. Sêdiq jî
piştî ku jê re gotibû:
201
”Keça min ne a şer e û wê li serê we bibe bele. Lê
madem we qîma xwe pê aniye, îcar dû re jî hûn min bi

agirê wê neşewitînin”, xwe ji keçikê bêrî kiribû û ji cem dabû rê.
Sadiq pir li ber xwe ketibû. Ew beşerxweşiya di ruyê wî de bi carekê ve winda bûbû û mîna quşûfê zer vedabû. Te hevt xincer lê xistibana jî belkî dilopa xwînê jê ne hatibaya. Ê wî ne carekê du caran kezeba wî şewitîbû. Du lawên wî di benga zewaca xwe de hatibûn kuştin û bi ser de jî keçê tomet anîbû serê wî. Lê dîsa jî ji bo wî a herî mezin ku keçik di nav eskeran de dima; bi wan re dixwar û vedixwar, radiza û li gundan digeriya.
Ji kuştiyên ku hatibûn naskirin pênc jê ji gundên derdor bûn. Dê û bavên wan xwestin ku termên xwe li gundên xwe veşêrin, lê Heso qebûl ne kir. Wan jî pir neda ser. Piştî ku li ser bênderan term şûştin û termên perçekirî bi hev dirûtin, term li ser çar darbestên mezin ku di nîv seetekê de çêkiribûn, dirêj kirin. Destê Heso ji Keyo ne dibû. Him ne dixwest ew daniya ser darbestê û him jî ne dihişt ku ji dêvla wî ve yekî din rahijta hefadê wî. Û wî bi xwe jî nikarîbû ew bersêng û bersêng bibira heta bi goristana Pîr Kemêl. Xwe li tena ne digirt. Dişelişî.
Sarê xwe aciz kir; devê xwe bir ber guhê wî û jê re got: ”Heso xwe hinekî bide ser hev, çavên her kesî li ser te ne. Ji dilê xelkê xwîn diniqute. Pêwistiya hemiyan bi te heye. Bipeyive û li ber dilê wan here û were.”
Mirov digot qey cinên kufrê pif guhên wî kiribûn; li tiştekî hayî ne dibû. Heta bi pevçûna çendikî berê jî ne hisiyabû. Li gora Sarê, ew haweyê han hîç jî pê ne diket. Ji ber ku sêl sincirîbû û dîsa ber bi wî de herikîbû. Bi goti-

nekê dikarîbû berê vê koma mezin bida rêya çûn û nehatê. Ya jî bi çend peyvikên xwe ên xweş kezeba wan ji rivînan bikira. Tam wextê wê bû. Di şerê eşîran de gava mêr diketin û cendekên wan radikirin goristanê, ji axa û maqûlan pê ve kesek ne dipeyivî. Di kêlîkên wilo de gotinên mezinan, ji bo malbatê û heval û hogiran ji melhema ser birînê jî bi tesîrtir bûn. Û Heso jî di çavên xelkê herêmê de bi qasî siltanekî mezin bû. Xelkê jê hez dikir û gotina wî li erdê ne dixist. Lê ji rewayê ketibû.

Di dawiyê de Keyo jî li ser darbestê kirin û berê xwe dan goristanê. Di vê navê re nûnerê partiyê ê herêmê Çolo, derket pêş û xwest ku pêşî wan çend carekî li dora gund bigerînin. Bi a wî kirin. Lê bi rakirina terman re, piştî ku hin pîrekên omerî û toriyan ji nav rezê qelêç lîlandin û ên li gund jî dan ber wan, dîsa qîr û qiyamet rabû!

Çoloyê cibiltînî qêriya: ”Eeehew! Çend fîşekan ber bi qereqola Qesra de berdin, hevalino” demaça xwe kişand û bi yek tûşê re cercûr vala kir.

Tiştê ku wî kiribû tam li gora dilê xortan bû. Keçên zoraviyan berî birayên xwe bi keleşkofan gihan û li girê Qesra girêdan. Qereqol di pişt gir de bû û bi dû fîşeka sisê û çaran de ji hikmê keleşkofê diket. Di her mala zoraviyekî de bi kêmanî du keleşkof hebûn. Hemiyan jî cercûrekî xwe vala kirin. Heger Heso bi xwe şiyar neba, tif ne kiriba Çolo û jê re negota:

”Bi rastî jî zilamin wilo hene divê pîrek nebin jina wan! Erê kuro lawo, ma ne navê te Çolo ye, tu li nav insanan

çi dikî? Ji xwe re here çolê, weh! Ma niha ev jî aqil e hûn bi qedrê Xwedê kin!” dibû ku ecêbek ji a îro mezintir jî bi serê wan de bihata.

203

3

Piştî bûyerên ku li Zorava û gundên derdorên wê qewimîn bi çendeyekî, çekdaran li Zorava jî bi navê ”komîteyan” gundî komik bi komik ji hev cihê kirin û li ser serê hev kirin mezin. Ji gundiyan re ”milîs guçler”, gotin û çek xistin destê her kesî. Lê Heso û Circîs ewa wan bi xwe ne xweş anîn. Li gora wan çekdaran bi wê yeka han derb li rêzgirtina rihsipiyan xistibûn û rê li ber xerabkirina tifaqa wan vekiribûn. Di hindurê demeke kurt de gundî dikarîbûn ji ber hev biketana û mîna salên berê dîsa têketana pêxêla hev. Lê li gora Reyis û çekdaran jî ew tevgereke demokratîk bû û bi tevgera demokratîk jî tifaq hîn xurtir dibû.

Reyis xelaskirina bajaran bi a gundan ve girêdabû. Gundî wek birêvebirên bajariyan didît. Ji ber wê yekê jî him ji gundan dest bi avakirina saziyan kiribû û him jî piraniya komutanên xwe ji gundiyan hilbijartibû. Qîmeteke mezin dida herêma Botanê, Xerza, Omeriya û Torê. Giraniya kar û barê xwe hemû jî danîbû ser van herçar herêman.

Di gundê Zorava de ji komîteyên zarokan û heta ku digiha ên kal û pîran hawe bi hawe komîte hatin damezrandin. Gund ne ewqasî mezin jî bû. Li vî gundî qey bîstsih mal mabûn ya ne mabûn. Ji bilî van komîteyan li

herêmê gelek komîteyên hinermendiyê jî saz bûbûn. Navenda komîta ”Xeratên Welêt” Stilîlê, a ”Sefarên Welêt” Midyadê û a ”Nalbendên Welêt” jî Kercosê bû. Lê Reyis piştî demekê gavanî û şivanî jî wek sinetkariyekê qebûl kiribû û ji wan jî komîte çêkiribûn. Navenda komîta
204
”Gavanên Welêt” gundê Kermêtê û a ”Şivanên Welêt” jî gundê Kersivanê bû. Ji mehê carekê xeratên herêmê li Stilîlê, sefar li Midyadê, nalbend li Kercosê, gavan li Kermêtê û şivan jî li Kersivanê li hev diciviyan; di derbarê kar û barên xwe de bi rojan piştî ku wek kewan radihiştin hev û kesî bi kesî tiştek ne dida qebûlkirin, çekdar diketin navbera wan, rapora xebatê dinivîsandin û di hikmê hevteyekê de rapor digihandin destê Reyis. Di vî warî de bi rastî jî Reyis her tim li gora prensîpên xwe ên ku danîbûn ne dimeşiya.
Dema ku li Kermêtê di civîna bihara sala 1988an de gavan û şivan ketin ber hev û du kes ji hev kuştin, Reyis jî nûnerên wan da ”Halk Mahkemesi”ya partiyê. Mehkeme ji sê çekdarên wî, yek jin dudu mêr, pîremêrek û pîrejineke gundî pêk dihat. Gelek mehkemeyên wî hebûn. Di vê carê de mehkemeyê urf û adetên xelkê bingeh girt; gavan neheq kirin, qerara kuştina mirovekî ji wan da û dosya şand ber destê Reyis. Reyis jî bi qasî ku komutanê xwe ê herêmê biavêje zindanê, xwe bi biryarê aciz kir, gavan mafdar dîtin û sê şivan bi kuştinê ceze kirin. Çekdaran li pêş çavên xelkê, hersê şivan jî li Kermêtê bi keleşkofan kuştin. Li gora gavanan, çûna kerê a bi keriyê pez

re ”antî demokratîk” bû; ker wê li nav dewaran ba. Û li gora şivanan jî divabû kerê xwarin û vexwarin û kulavên wan hilgirta.
Li Kerboranê jî bûyereke wilo tahl qewimî. Kerboraniyan bi mebesta ku çima gundê wan ne bûye navenda nalbendan, êrîş birin ser kercosiyan û sê kes ji wan kuştin.
Reyis jî piştî ku sê kesên kerboranî, bi rêya komutanê herêmê dan mehkemeyê û mehkemeyê jî hersê di nava
205
gundê Kerşafê de daliqandin, Kerboranê kir navenda ”Kurtankerên Welêt.”
Îcar di kongra ”Haletfiroşên Welêt” de, Reyis yekser pê li prensîpên xwe kir û nûnerê haletfiroşan Kodoyê kersivanî bêyî ku bide mehkemeyê da kuştin. Di eslê xwe de ê kuştinê divabû ne Kodo, Simoyê zoravî ba. Xelkê wilo digot. Simo xistibû serê Kodo ku haletên hesinî di erdên xiramî û tahtikî de ji ên darînî qewîntir bûn; gîsinê hesînî bêhtir xwe bi nava rewê de berdida û zexelî dikuşt. Kodo bi a wî kiribû û li ser navê partiyê rê li ber xelkê herêmê xistibû ku ji xwe re haletên hesinî bikirin. Lê Reyis jî ew tevgera wî wek dijminahiyeke mezin bi sosyalîzmê re dîtibû û cezayekî giran dabûyê. Çekdaran, Kodo li Kewarêxê bi arpiciyan ji hev perçe kiribûn.
Omerî û toriyan pir kêfa xwe bi Reyis dianîn ku herêma wan bûye qada civîn û konferansên sinetkaran. Lê Heso xwe pir aciz dikir ku çima li herêmê, komîteyên bi navê maqûl, rîhsipî, dengbêj û mitirbên civatê jî ne hatine damezrandin. Heta bi vê mebestê nameyek ji Reyis re

şand. Reyis jî dilê wî xweş kir û got ku di wextekî nêzîk de ew ê jî çêbibin. Lê digel ku demek dirêj di wê navê re derbas bû, dîsa jî çênebûn. Bi tenê yek ji xortan çêbû û hew. Wan jî stiranên gelêrî li gora şerê xwe difesilandin û bi rengekî eskerî pêşkêşî xelkê dikirin.

206

BEŞÊ DEHAN

1

Berfa ku bi destpêka zivistana sala 1989an re, ji sênga ezmanê Omeriya mîna pemboyê helebî, xelek xelekî bi ser keziyên dar û deviyan de weşiyabû, Serdarê ku Reyis ew kiribû komutanê herêma Mêrdînê, dû re jî ê Xerza, Dêrsimê, Amedê, Serhedê û dû re jî ê Botanê û çend cihên din, li qelaçên Darê ji xafil de girtibû û ew xistibû nav livînan.

”Rez ne baş bû terizê jî lê xistibû!” Ji şerê ku dohtira rojê bi tabûra Şirnexê re kiribû, guhên wî giran bûbûn. Lûleya keleşkofê kefa destê wî ê çepê jî şewitandibû. Ji mirinê filitîbûn. Heger şev bi wan ve ne gihaba, ji ber helîkopteran jî maba xelas ne dibûn.

Gava ku Serdêr bi milama belavkirina partiya xwe ji Bahdînanê dabû rê, hevalbendên wî partî ji zû de ji hev belav kiribûn û xwe gihandibûn Ewrupayê jî. Çend hevalên wî ên ku li Binxetê mabûn, ew jî ketibûn nav partiya Reyis. Heger komunîstên iraqî li wî û ên pê re xwedî derneketibana, Reyisê ku ji wî û Reşo dipelikand û têkiliyên xwe bi mixaberatan re xweş kiribûn, wê bi rêya mixaberatan ya ew teslîmî eskerê tirkan kirbana û yan jî dabana kuştin. Li gora wî Serdar zilamê pevçûnê bû û mirovên

wilo jî di nav kurdan de bi hêsanî dikarîbûn heval ji xwe re peyde kiribana. Heger komunîstan soz ne dabana Reyis ku di wextekî kurt de wê Serdar bişandana Ewrupayê, Reyis dev jê bernedida. Bi hêz bû, dikarîbû a dawî tê de bikira.

Serdêr xwe gihandibû Swêdê, lê destûra rûniştina xwe

207

hinekî dereng stendibû. Ew jî hemû ji ruyê Seydo. Jê re gotibû ”swêdî me bi bav û kal nas dikin.” Wî jî bi a wî kiribû. Lêbelê Seydo jî gotibû ”ez ji malbata pizûriya me; pizûrî li herêma Nisêbînê bi ehmeqî û mêrkujiya xwe bi nav û deng in!” Û polîsan jî bi dû wê îfadeyê hema bi çend seetekî rûniştin dabûnê. Seydo pir li ber ketibû û li ser wî kulmek li komsera polîsan xistibû. Diranekî wê leqandibû. Komserê jî ew li dora hevteyekê di nexweşxaneyê beşê pîsîkriyatê de zeft girtibû.

Rêberê Serdêr Seydoyê birayê Reşo, Serdar û zarokên wî xistibûn xaniyê xwe û li ba hevalê xwe Tozo mabû. Li gora ku digotin, çi tiştê ku ji destê wî hatibû di hindama wan de texsîr ne kiribû. Dev ji araqvexwarinê û çûna kerxaneyên Elemanyayê berdabû. Çixare jî terikandibû. Ji bo kufletê Serdêr ling ne xistibûn bin xwe; mîna çewkê ji wî karî bazdabû karê din û qezenca karê xwe hemû jî li wan xerc kiribû. Heta ji bo wan xwestibû ku li nav bajêr texsîcîtiyê jî bike. Bi haweyekî ajotname stendibû. Lê çi fêde piştî ku çend carekî ji malê berê xwe dide nav bajêr, rêya malê dernaxîne, hewarê ji Tozo dixwaze û Tozo jî diçe pê ve, dev ji karê texsîcitiyê jî berdabû. Li gora ku Tozoyê

serhedî digot, Seydo tam neh caran jî texsî kirê kiribûn; bi texsiya xwe dabû dû wan heta ku gihabû mala xwe.
Têkiliyên Reşo û Serdêr bi nameyên ku Reşo ji girtîgehê li ser navê Seydo dişandin Stockholmê, çêbûbûn. Reyis Reşo qanih kiribû û ji Reşo jî xwestibû ku ew Serdêr bi haweyekî razî bike û wî bişîne ba wî.
Pêşî dilê Serdêr ji Reşo mabû. Lê dû re bi a wî kiribû; jin û zarok di stuyê Seydo de hiştibûn û berê xwe dabû Reyis.
208
Seydo biryara ku wî dabû bi xwe ne xweş anîbû û hişk çûbû ser:
”Tu jî û Reşo jî hûn tam kurd in; yanî hûn beredayî ne. Hûn ji aqilê xwe bêhtir bi dilê xwe tevdigerin. Hûn ne bi a êqil, hûn bi a dilê xwe dikin. Kurd wilo ne. Miletên paşdemayî hemû wilo ne. Hûn heraqê şer in. Kî şer bike hûn li wir in. Ker û kûçik jî şer bi tirkan re bikin, hûn ê ne fikirin ku heywan wê nikaribin bi insên û hûn ê li ba heywên cih bistînin. Şer û pevçûn karekterekî kurdî ye.
Jiyan araq, goştê elok û berxan, çixare, seks û ger bû û min ji bo te dev ji hemiyan berda. Lê te jî wek Reşo tu carî li min guhdarî ne kir û gotineke min ne xist serê xwe. Kurdistana çi bavê mino! Ji şer re jîr û zanahî divê. Û miletê kurd hîn jî trovirî ye. Neçe! Reyis û mezinên wî bi hosteyî dest bi xerabkirina Kurdistanê kirine; nebin şirîkê wî.
Mîna Aydin û Sînanê ku Ewrupa tije komeleyên kurdî kirine, tu jî di ser qayişa wan re li Sotockholmê ji xwe re federesyoneke kurdî veke û di federesyonê de heta tu karibî,

bi tirkan re şer bike! Ji sibehê heta razanan biavêje vî û wî û temamê dinyayê; wê bêhna te derkeve. Dev ji Reyis berde. Li Aydin guhdarî bike da tu bizanibî bê ev Reyis mexlûqekî çiqasî bêbav û kurddijmin e! Ax Aydin, ku hema tu hinekî jî bi cesaret baya! Him wî ajan dibîne û li ser ajantiya wî dinivîsîne û him jî gava Reyis lê teng dike, ji her kesî bêhtir ew wî diparêze."

Serdar hêrs bûbû. Heger Seydo wek zilamekî têgihiştî bizanîbaya, dikarîbû lêxista jî. Di dawiyê de:

"Erê kuro, jina min û tev li zarokan ji te re", gotibû û xwe berdabû Sûriyê ba Reyis.

Reyis jî piştî ku di derbarê şexsiyeta wî de "istixfarna-

209

meyek" jê xwestibû, li ber xwe ketibû û dû re jî xwepiçûkkirin bi xelasiya welêt ve girêdabû, istixfarname nivîsandibû û ew kiribû komutanê herêma Mêrdînê.

Bi hatina Serdêr partî geş bû. Hevalên wî ên kevin tev li gundiyan hema hema hemiyan jî dan dû. Lê piştî ku Reşo ji girtîgehê derket, di hindurê çend hevteyekî de xwe gihand Reyis û Reyis jî yekser ew kire komutanê herêma Mêrdînê, partî di herêmê de ji dewletê jî xurtir bû. Li hêla Xerza jî wilo bû. Reşo lawên maqûlan, şêx, mela, axe û began li dora xwe civandin û bi qeweta wan hema hema nîvê bakurê Kurdistanê zeft kir.

2

Bi bangdana mela eşayê re herduyan jî xwe di rext û bombeyan de rapêçan û G3 avêtin milê xwe. Yekî xwe ji taxa Heciyan, ê din jî xwe ji taxa Filehan berda û pêrgî hev

hatin. Kûçik reyan. Hin bi kûçikan re xeyidîn. Lê çend gundiyên ku ji êzingan dihatin û li ser hewdê Evdobelkê kerên xwe av didan, ber bi wan de meşiyan. Xwestin ku wan nas bikin. Mina ku herdu jî ji bo şevê xuliqîbûn, wek reşkê şevê xwe ji ber çavên wan winda kirin, gavên xwe dirêj radan û bi taxa Kelehê de hilkişiyan. Ji ser hewd reşê herduyan di berpala gir de bi reşayê re bûbû yek û mîna dêwan xuyanî dikirin. Mirov digot qey Bertewîlê Darê û Ebûzêdê Benîhilalî ji gorê rabûne û dîsa wê di qada şer de hevdu bigrin. Çavên wan li ser hev bû. Lingên wan ne digiha axê; bi hemd pê li tahtikan dikirin û di ser latan re diqevizîn. Dilê herduyan jî sivik lê dixist. Yek likumî, ê din bi lez ber pê de kişiya. Wî lê nerî. Ew sekinî. Dîsa dan

210

xwe. Bi hev re gihan ber kendêl, sekinîn û li hev nerîn. Dengê salan bi xuşîniya çem û bayê ku li darên hejîrên rihanî, zeytûnî û şingalî dixist re bûn yek, zingînî bi guhên wan xist û rengê jiyanê mîna filîmekî di ber çavên wan re derbas bû. Bi lez xwe zer kirin hev û bêhnçikyayî xwe li hev pêçan. Piştî ku qederekî bêdeng dilê xwe bi kul û derdên zemên sincirandin, bi destên hev girtin; li ezmên nerîn û çong berdan erdê. Dinya sahî û heyvreşî bû. Pîra şevê rêsê xwe ji navsera çiyayên Omeriya gindirandibû binê newala Qurdîsê û her der di reşayê de xerq kiribû. Çirûsk bi stêran ketibû û ber bi dinyayê de dikêşiyan. Ezman mîna bajarekî bi ser gundê Darê de pêketibû.

Reşo xwest ku çixareya xwe pêxîne. Serdêr hişk bi destê wî girt:

”Vir ne cihê çixarekişandinê ye”, got û rabû ser xwe.
”Bi ku de?”
”Vir ne cihê şêwir mişêwrê ye jî, her der bi guh e bide dû min.”
Ê ku nizanîba wê bigota qey dinya hemû bi dû wan de ye, mîna dizan meşiyan û xwe ber bi taxa Axê de berdan. Vir jî li hesabê wî ne hat. Li hindama birca Bertewîl nerî:
”Na”, got û berê xwe da taxa Filehan.
Reşo wek dareke hişk sekinî:
”Em dikarin di xindeqekê, sarincekê, neqebeke kufarî, berpalekê û yan jî di şikeftekê de bipeyivin.”
Xwe aciz kir:
”Dengê xwe neke, vê carê jî tu bi a min bike!”
Reşo fêhm kir ku êşeke giran xwe berdaye ser dilê destbirakê wî.
211
”Li ser çavên min Ebûkatê Jinan, tu çawa bixwazî bila wilo be”, got û nema dengê xwe kir.
Serdar di vê bêhnikê de ji sîha xwe jî ditirsiya; firandina çûkekî dikarîbû bûba sebebê dilqetandina wî. Gelek tiştên xerab bi hev re hatibûn bîra wî. Yekê yek didahfand. Çend hevalên xwe ên hêja bi destê xwe kuştibûn. Bombe avêtibûn malên pîberan. Zarok perçe perçe bûbûn. Di ruyê wî de hin gund hatibûn şewitandin. Dest danîbû ser malê xelkê. Gelek kes ji cih û warên wan kiribû. Keç û xortên ku nuh ketibûn çax û benga xwe, rakiribûn çiyê. Ma li ser destê wî çi û ne çi hatibû kirin! Heta bi qantirên ku komira

Şirnexê dikişandin jî kuştibûn.
Ji jora taxa Filehan dîwarên Hepsa Darê bala Reşo kişand. Niqutî dilê wî. Lê ji ber ku ji aliyê wî ve tu carî bi xerabî ne fikirîbû, li xwe ne kir tiştek û nermikî peyivî:
”Ma tu dixwazî me bi ku de bibî Ebûkat?”
”Hinekî bi sebir be!”
Bi dengê xelbe xelba ku hat, xwe xistin taldeya dîwêr û bîstikekê sekinîn. Çend rîhsipî diçûn şevbihêrkê. Bala xwe ji rîhsipiyan bêhtir dan ser herdu pîrekên ku ji hewşa xaniyê nêzîkî wan diavêtin ser zarokên xwe. Lawê herduyan çekdar bûn û hevteke berê hatibûn kuştin.
Sêrdêr piştî ku bi dizîka çavên xwe ji hêsiran paqij kir, axîneke zirav û dirêj kişand:
”Min gû xwar! Te ez bi dev û rû xistim nav temamê pîsiya dinyayê. Û ez nema dizanim bê ez ê xwe ji nava vê pîsiyê çawa xelas bikim!” got û pekiya dera han.
Reşo da dû, ket bin çengê wî û bi lez çûn. Gihan binya malan. Hilmekê sekinîn û li deriyê hepsa ku wek devê cenewarekî ji wan xuyanî dikir, nerîn.
212
Serdêr bêhnçikyayî:
”Were!” got û mîna teyrekî xwe dada hindur.
Ê din jî wek wî kir. Lêbelê li hêwana pêşî li ber bîra Kuştiyan rawestiya û di deriyê hêwana duduyan re li devê deriyê zindana ku mîna devê newaleke bê binî vebûbû, bi heybet temaşe kir.
Serdêr ji ser neqebên zindanê dîsa bang kir:
”Were!”

Ev bêhnekê tevnegeriya.
Wî dîsa bang kir:
”Were binê zindanêêê!” got û bi qûnkişkê xwe bi neqeban de berda.
Reşo ket pey. Ket pey lê wilo jî got:
”Ev çi bi te hatiye, Ebûkat?”
Wî bi hêrs destê xwe hejand û melûlekî jî got:
”Dirêj neke lawê Meyro, were!”
Reşo veciniqî! Ji bo ku tirsa xwe nede der bi ken:
”Ma tu dixwazî min bikujî?” got û qûndaxa sîlehê xwe ber pê de rada.
Qûndaxa ku gihabû piştê heliqand:
”Nepeyive, were!”
Ne çû. Lê Serdar hîn jî bi neqeban de dadiket.
”Were ez ji te re dibêjim!”
”Erê kuro tu xurifî yî? Bi roj mirov nikare xwe berde Hepsa Darê. Me bi çavgirtînkê daye nav mayinan; binere em ê di devernan de werbin û perçe perçe bibin!”
”Bi telaq ku tu neyê ez ê berdim te!”
Reşo piştî ku got:
”Emirê me ji Xwedê. Lê Serdaro te e z ji desthilanîn xistim”, xwe bi ceger kir û mîna kwîran bi destlepikê
213
daket.
Teqnekî xwe berdan. Lê hîn sê-çar teqnên din ji wan re mabû. Zindan li ser çil û heşt derenceyên ku ji kevirên yekperçe û cih bi cih gazekê û du gazan bilind dibû, dadiket binê erdê.

”Bi rastî jî Reşoyê Darî fêrisekî zilaman bû, ha!”
”Lê jina wî hîn jê fêristir bû”, Serdêr got.
”Na. Gava jina wî ji ser van neqeban perçeyên goştê zilamê ku kuştibû têwerdikirin, Reşo jî li jêra te xincera xwe kişandibû û nav di xwe dida...”
Serdar beşişî, bêhna Reşo hat ber.
”Lê tu ne Reşoyê Darî, Reşoyê Sarê yî”, gundiyan ev nav lê kiribûn, ”were!” got û li ser neqeba binê zindanê pala xwe da neqeba din.
Reşo dereng giha ba. Li tenişta wî rûnişt û bi hêviyeke mezin li hev nerîn. Lê yekî jî ruyê ê din ne didît. Ma wê çawa bidîtana? Her der mîna teniya binê beroşê bû. Serdêr piştî ku lepê xwe ê mezin danî ser kaboka wî, serê xwe berda ber xwe û bi dizî got:
”Reyis em, û me jî miletê xwe weritand, hevalo!”
Reşo mîna ku ji dara ziyaretê bikeve:
”Çi çi?”
Wî gotina xwe bi car kir. Lê ji a berê jî hîn bi hêdîtir got.
Zindana Diyarbekirê û liberxwedana wî hat bîrê. Hêrs bû. Dengê xwe hilda:
”Ez te fêhm nakim! Tu ji çi ditirsî? Ne çeqmaqê min û te û ne jî luksa Heso û Circîs dikarin reşaya vê zindana binê zilma zemanan ronî bike. Guleyên metilyozan jî nikarin vê reşayê derbas bikin. Bike hewar û hewar, li
214
tarîxê biqîre, zilmê têxe devê tivingê, biteqîne” û sê fîşek li ser hev berdan.

Serdar hinekî di cihê xwe de cemidî.
”Temam, temam!” got û bi destê wî girt.
Reşo jî piştî ku çixareyek ji xwe re û yek jî ji wî re
pêxist, da dest û got:
”Bibexişîne”, zendên xwe di stuyê wî re derbas kirin.
Herdu jî bi agirê çeqmêq û dengê sîleh vebûbûn.
Sêrdêr ji cihê ku lê awiqîbû dewam kir:
”Reyis çi got, tev li min, me hemiyan ew kir. Şerê me
carina baş û carina jî xerab zîvirî. Lê wî, başî kire malê
xwe û xerabî jî kire malê me û em bi hev dan kuştin. Min
li ser gotina wî komutanê herêma xwe kuşt. Ê Amedê jî ê
berî xwe kuşt. Komutanê herêma Botan û ê Xerza...”
”Sebeb çi bû ku te kuşt?”
”Wî û hevalekê ji hev hez dikir.”
”Bi mêr an bi dergîstî bû?”
”Na. Ne bi mêr, ne bi dergîstî û ne jî bî bû.”
”Ê Amedê li ser çi bû?”
”Li ser ku di nav xelkê de gotibû ez dişibim Reyis.”
”Ya ê Botanê?”
”Kordînator şika revê jê kiribû.”
”Yanî hîn ne reviyabû we ew kuşt ha?”
”Erê.”
”Û ê Xerza?”
”Bombe avêtibû mala yekî pîber. Zarokên wî hatibûn
kuştin. Îcar piştî ku gundiyan bi xwe ne xweş anîn û mesele
di eleyhême de geriya, Reyis jî ew da kuştin.”
”Lê ma ne Reyis bi xwe di gelek nivîsên xwe de dibêje
ku tiştekî ji pîberan sax bernedin.”

”Rast e, lê gava ku ne baş dizîvire, dibêje ‘ew taktîk e.’
”Ê, dewam bike.”
”Li ser gotina wî her ji çend mehekî me bêş avêt ser her kesî. Ên ku di ber me û danê re ne gihan, ya me talan kir û yan jî me ew ji gundê wî derxist. Dû re jî me zarokên wan rakirin çiyê û di şeran de me ew dan pêş. Hin bûn pîber. Pîberî ji ber xwe ve derneketiye.”
Reşo piştî ku çixareya sisêyan jî pêxist:
”Yanî tu dibêjî hemû bi partiyê ev tişt bûye?” got û ser dev û ruyê xw efirkand.
”Na. Di vî warî de paya dewletê ji a partiyê hîn jî pirtir e. Lê partiya çi, tekî ye. Em mirîd û Reyis jî şêxê me ye.”
”Nebe mirîd.”
”Me ji dest xwe berda. Vî şêxî tiştekî wilo bi serê me de aniye ku yek ji me nama dikare baweriyê bi ê din bîne! Ew ne ji me ye”, got û devê xwe bir û anî.
”Yanî çi?”
”Yanî Umberto Eco...”
Reşo xwe aciz kir û peyva wî birî:
”Yanî Umberto dibêje ajanê herî bi serketî ew e ku” got û sekinî.
Serdêr jî mîna wî lê xist:
”Erê wilo ye.”
Piştî ku Reşo bi hêrs got:
”Tu neheqiyê li Reyis dikî”, rabû ser xwe û li reşê meşiya.

Dû re jî çeqmaqê xwe pêxist û li hindurê zindanê geriya.
”Ma tu dixwazî ez ji te re empûlan pêxim?”
216
Reşo veciniqî!
”Empûlên çi?”
Generalên tirko ji ber me, sala çûyî elektirîk kişandin zindanê.”
Lingê xwe li erdê xist û bi kêf got:
”Tu qenciyeke mezin bi min dikî, pêxe!”
Çûn û hatina wî hemû pênc deqîqe ne girtin.
Zindan pêncî-şêst metreyekî dirêj û sîh-çil metreyekî jî fireh dihat. Reşoyê ku bi vî haweyê niha zindan ne dîtibû, mîna dînan ber bi şeş-hevt hicreyên bakurên zindanê de meşiya û li ber ên navê sekinî. Bala xwe ji kevirên ku wek felqeyên zinaran mezin dihatin bêhtir da ser nêzîkaya navbera wan. Hemû jî bi hev ve û du metreyekî ji hev dûr bûn.
Bi ser de jî yekperçe bûn. Mehkûman nikarîbûn bi tepe repa dîwêran jî tiştek ji hev fêhm kiribana.
Kire niçe niç:
”Teresbavên tarîxê wilo hicre çêkirine ku qurbanên wan hîç nikaribin têkiliyê jî bi hev re deynin”, got û li aliyê başûr nerî.
Li wir jî di temtêla van de ewqas hicre hebûn.”
Serdêr bi dengekî nizim:
”Lê hicreyên Reyis ji van jî xerabtir in!” got û diranên xwe li reyis qiriçandin.
Xwêziya Reşo di ber de ma û ecêbmayî sekinî:
”Hepsa partiyê bi hicre ye, ha!”

”Him jî çawa hicre! Ên vir du metreyekî bilind û sê metreyekî jî fireh in, lê ên Reyis hemû jî yekmetreyî nin.”
Dengê xwe ne kir; bi aliyê rohilatê zindanê de meşiya û li ber ”qula bêdawî” ku di dîwêr de hatibû kolan bi haweyekî din peyivî:
217
”Li gora rîwayetên misilmanan Hemzeyê Pêhlewan vir qul kiriye û di vir re reviyaye. Ma dikeve serê te Ebûkat?”
”Nakeve serê min...”
Xwest li bin zikê zindana ku bê stûn raxistîbû binere. Serê xwe rakir û tewiya, rakir û tewiya; di dawiyê de xwe li ser piştê veziland:
”Haho bê aqd e! Bê çi rast û şahîk e jî! Kevirên dirêj wek beştan bi kar anîne. Ebûkat ew kulekên bi bin zikên wê ve ji bo hewayê ne. Û ew kulaka li aliyê roava jî ji bo ronahiya zindanê ye...”
Bi lingê xwe binê zindana ku resîfkirîbû û li ser qamekê jî tije zibil bûbû, kola. Dû re ber bi hicreya ku wek şikeftekê di binê neqeban de bû meşiya û derbasî hindurê wê bû. Hicre du-sê metreyan fireh û çar-pênc metreyan bilind bû.
”Hey gidî dinya hey, kî dizane bê niha çend fêris di vir de hatine kuştin? Ebûkat, li girtîgeha Diyarbekirê me ji vê re digot ‘hicra kor!’Wek vê çar hicre hebûn û ez di herçaran re jî derbas bûm. Li vê hicreyê mirov dadiliqandin û êşkenceya herî mezin li mirov dikirin!”
Serdêr dîsa a xwe got:
”Îcar xwezîka ên Reyis hema wek vê jî bana! Ên wî

pênc heb çal in. Di binê zindanê de li ser çar metreyan hatine kolan...”
Reşo destên xwe xistin kêlekên xwe, wek singekî sekinî û ziq lê nerî. Piştî bêhnekê jî ”ez bi te bawer dikim lê ez naxwazim bawer bikim; Reyis nikare ewqasî bibe cenewar!” got û ber bi kulekên di dîwaran de meşiya.
”Reşoyê Sarê tu hîn nuh î; heqê te heye.”
”Bi baweriya min em vê meselê bigirin wê baştir be.”
218
”Me negirta baştir bû. Lê ji bîr neke, di rojekê de ji ber Reyis wê ev zindan jî nikaribe te bistirîne”, Serdêr got û bi neqeban ve hilkişiya.
Reşo bi dû de lezand:
”Dilê xwe ji min negire. Gava ku ez jî wek te bifikirim ez ê nikaribim ne şer û ne jî dilê xwe li eskeran hênik bikim...”
Serdêr jî piştî ku elektirîk vemirandin û ew bir ser bîra ku bi qasî kûraya zindanê kûr dihat, ”wê rojek bê ku ji ber Reyis di vê bîrê de tu ê li stara xwe bigerî”, got û berê xwe dan birca Bertewîl...
219
BEŞÊ YAZDEHAN
1
Heso destê xwe hejand, keniya û ji hindurê odeya xwe bang kir:
”Hevala Sarê, hevala Meyro! De ka werin bê hûn çi dibêjin lê?”
Sarê li ser dika hewşê pala xwe dabû dîwêr, li ber

germa tavê rûniştibû û ji kûr û dûr difikirî.
Wê jî tewirand:
”Îcar tu ê çi bifroşî bavê Temo?”
”Ez dibêjim ka em ê vî keriyê pezê xwe jî bifroş in û perekên kerî bidin bi dolmîşekê.”
”Çima?”
”Çi çima! Ma her roj em ji şêrgeleyên mêrik re pezekê serjê nakin? Belê. Îcar gava me pez da bi dolmîşê, şêrgele efendî jî wê nikaribin hesin bixwin.”
Sarê xwe aciz kir:
”Kuro tu wek mişk î; ji xerabkirinê pê ve tu li tiştekî din nafikirî. Te xwe ji keriyê elokan û mêşên hingiv safî kir, îcar niha jî dora pezkê me ye.”
”Erê keçê, em ê dolmîşê li ser rêya Nisêbînê û Mêrdînê bixebitînin. Bi telaq em ê qiyametek pere qezenc bikin. Wereqeya me dibe merqê elemanan, em ê tê de bimînin pîrika Reşo!”
Sarê xwe aciztir kir:
”Hey qirn bi te keto, ji Xwedê bitirse! Gundek qatixê vî pezî dixwe...”
Hesoyê ku şimik di lingan de û xwe tena bêceme li ser
220
derzika piştê ramidandibû, di ber xwe de piştî ku got, ”jinik ji hêka xwe de sosyalîst e bavo”, dengê xwe hilda:
”Erê hevalê, ma ne îro kongereya hevalên me ên jinan bû, tu çima ne çû yî kongereyê? Ma wilo ji te re diserife, hi?”
Zibêr bi lez dihat û gihabû binya mizgeftê. Kerîm jî bi

dû de bû. Sarê herdu jî dîtin. Benê newqa xwe şidand, xwe da ser hev û got:
”Kuro belqityo dev ji xwe berde, tu li beleyê digerî û bele jî li navtarên gund ha ha diçin û tên. Binere wilehî wê ev zigurd migurd hilê te li milên te bikin û derbnan li te xînin. Li cihê xwe rûne û serêşaneke din ji me re çêneke. Tu bi êgir dilîzî. Devê xwe bigire Zibêrko tê.”
Heso bi rastî jî li beleyê digeriya. Çekdaran şimik û bêceme li gundiyan qedexe kiribûn û wî jî di ser qayişa wan re di mala xwe de herdu bi kar dianîn. Car carê gava ku gazî gundiyan dikirin, hin ji wan bi bêceme û şimikê dihatin nik wan. Û ew yeka han jî dibû sebebê texirandina karê çekdaran. Nikarîbûn zû bimeşiyana. Bi roj divabû her kes her tim xwegirêdayî û ji bangkirinê re amede ba. Derengiyê têkbirin û têkbirinê jî dawiya hemiyan dianî. Ji ber vê hindê bû ku Reyis ew mecbûriyet wek mercekî partiyê danîbû. Û Heso jî qeşmeriyên xwe bi wî mercê wî jî dikir. Tew îcar Circîs bi qabqabkan û tena derpî li hewşa xwe diçû û dihat. Rojekê lingekî wî di qabqabkê de fisiyabû û hindik mabû bişikesta.
”Hevala Sarê te got sorimlî hat?” Çekdaran Zibêr kiribûn mezinê gund. ”Hat hat îcar çi yanî?”
Dû re jî bi dizîka, ”ê ne ez ê şerwêl li xwe nekim”, got û çeng bû û mîna zîzokê li dora şerwêl çû û hat.
221
Kişand xwe.
Kerîm li ser dikê rûnişt.
”Yada Sarê, ma ji we çiqas pere xwestine?”

”Perên çi lawo?”
Madê xwe tirş kir û dengê xwe hilda:
”Mêrikan dîsa bêş avêtine ser me. Ev Reşo doza çi li me dike? Ma em li Elemanyayê nin ku her meh em bikaribin çend milyonekî bidin wan? Şîretekê li vî Reşoyê xwe bike, wilo nabe!...”
Sarê bi ax û keser got:
”Lawo wileh ez jî nema tiştekî ji hev derdixînim. Edaleta Reşo ji a Nûşê Rewan jî bêhtir bû. Ev lawik hîn ji zarokiya xwe de wilo bû. Ez bawer nakim ku Reşokê min van tiştik û miştikên bêser û qûn dike.”
Kerîm darikê xwe di erdê de bir û anî û serê xwe hejand.
”Insên şîrê xav xwariye, ew demek bû.”
Heso dengê wî kir. Qutik avêt dera han, xwe da ser gopêl û lezand. Û ji devê derî jî peyivî:
”Dîsa dawiya zilamtiya me hat, kesek nema li me guhdarî dike, em ne li ber tiştekî ne. Ev çi kûçkanî ye! Goşt û xwarina ku em didin û mesrefa ku em li wan dikin ne bes e, bi ser de jî em ê her roj pereyan bidin wan! Ma em benqa dewletê ne? Ma em xezîna Siltan Hemîd in? Erê kuro ma wilo dibe? Rojekê ji bo solan, rojekê ji bo cilan, rojekê ji bo fîşekan, rojekê ji bo sîlehan pere! Pere û pere! Kasetan bikire, rojnameyan û kitêb mitêban bikire; îcar ku niha bi kurmancî bana jî dîsa xem ne dikir lo. Tew ma ji xwe kula vê abonetiyê qey tê kişandin!...”
Çekdaran salê çar caran ji temamê gundan pere didan

hev. Mercekî partiyê bû. Danheva pereyan jî wek ku Heso digot her tim bi navê tiştekî bû. Ji bilî ku di havînan, bihar, payiz û zivistanan de pereyên salê didan hev, ji mehê carekê jî kasetek ku ji şîretên Reyis dagirtîbû difirotin her malê. Herwiha kovar û rojnameyên xwe jî. Gundî ji her tiştî bêhtir li ber pereyên ku li kasetan, rojname û kovaran didan, diketin. Fêhm ne dikirin, hemû bi tirkî bûn. Bi endametiya partiyê jî xwe diêşandin. Çekdaran, piçûkmezin temamê kufletê malê wek endamên partiyê qebûl dikirin û her meh pere ji wan distendin. Mala ku pere jê nehata jî mecbûr bû keçeke xwe ya jî lawekî xwe bişanda çiyê. Mercek bû. Lê mala ku him bê keç û law û him jî feqîrî ba, wî çaxî jî bê vir de û wir de divabû her gotina çekdaran bi cih bianiya.

Sarê bi haweyekî ji xwe piştrast:

”Ez bawer nakim ku Reşokê min bikaribe vê zilmê li xelkê bike û van gotinên tirovirî bi xelkê bide gotin. Mezinê vê birekê kî be hemû ew dike”, got û şahra serê xwe ediland.

Kenêrê ku bêhnek berê hatibû û li himberî wê rûniştibû:

”Tew Sarê tew, xwezîka her tişt di destê Reşoyê Sarê û Serdêr de ba. Lê na. Ew jî mîna van naşîkên ku bi nav gund ketine, tiliya xwe tînin ber çavên xelkê û emir dibarînin, esker in. Zilamê esker emirber e. Qomandarê wî çi bibêje ew ê jî wê bike. Mezin bifikirin. Li jorê binerin û serê xwe bi wir ve biêşînin. Mak xerabe ye. Salên derbasbûyî li me vegeriyane û hêdî bi hêdî li dora me dizîvirin.

Lê hûn bi a min nakin. Îcar wê rojek bê hûn bi a min bikin

jî wê nema xêr bike” got û li Heso nerî.
223
Heso jî mîna mirîdekî destê xwe dabû ber ruyê xwe, lê guhdarî dikir û difikirî.
Kenêr rê neda Kerîm, destê xwe hejand û lib libî got:
”Ez ne xwediyê vî welatî me, ji ber ku bihustek axa min tuneye. Û bi ser de jî teriya mişkekî bê çî ye li mala min bi erd nabe. Ez û navmaliya xwe her tim em li aziyê ne. Bi tenê ez kurd im ewqas. Ev doz pêşî a we û dû re dû re a min e. Hûn ji bo mal û milkê xwe divê her tiştî bidin ber çavên xwe û her tiştî bikin. Netirs in. Li ber xwe bidin. Heso, te mezinahî ji dest xwe derxist û te xwe bi dest ê li newala Nesarayê ve berda. Heger te ji serî de bi a min kiribaya, te ê îro jî di vê havînê de ev şerwal bi ser bêceme de li xwe ne kiribaya. Lê hîn jî hûn dikarin gelek tiştan bikin.”
Gotinên wî ji Heso bêhtir tesîr li ser Kerîm kiribûn ku ji nişkê ve:
”Ji pîberiya dewletê pê ve tiştek me xelas nake”, got û ziq li Sarê nerî.
Lê hişê Sarê jî li ser Mela Salar û Erol Efendî bû. Gihabûn hewşê.
Heso xwe bi ser hev de pirnisand:
”Ji Xwedê bêhtir şeytan û ji şeytên bêhtir jî ev Reyis me nas dike. Bi dostayî dijminahiya herî mezin bi me kurmancan re dike. Heger hema piçekî ji me hez kiribaya, zarok ne dikirin mezinên me. Kenêr, xwezî ji serî de min jî wek Circîs bi a te kiribaya. Lê min mala Circîs jî bi a

xwe re xerab kir. Li me bû dereng birako. Ez te fêhm
dikim. Lê ma dibe ezbenî? Wê xelk ji me re nebêjin çi!
Em û pîberî ha! Barkirin jî bi kêrî me nayê. Bi rastî em
mane heyirî, em nema dizanin bê em ê çi xweliyê li serê
224
xwe û hevt sed bavê xwe bikin. Qeda Xwedê bi wan û şerê
wan keve! Bûne şêrêz û bi me ve zeliqîne. Herdu aliyên
dêr jî bi gû ne; çep û rastê me, pêş û paşê me bi gû ye.
Hema em di nav gû de mane û hew!”
Mela Salar zû dest bi gotinê kir:
”Heso tu tiştan pir mezin dikî. Şerkirên me hemû jî hîn
xort in; li wan negire. Aqilê xortaniyê...”
Wî xwe zewirand û bi herdu destan:
”Erê bavê mino Mela, em jî xort bûn. Lê me tu carî
jinên xelkê xewle ne dikirin; mêrê wê li hewşê ne dihişt û
bi jinikê re em di hindurekî de ne dipeyivîn. Kuro hemû jî
wek cendirma ne! Sêwlekekî ku kes nizane bê bezê bin
guhên bavê wî ji ku derê ye û ji min re dibêje ‘di civatê de
lingê xwe ranede, bi tizbiyê nelîze, pişkoka çakêtê xwe
bigire, goran ji lingên xwe dernexîne’ ma em li eskeriyê ne
weh! Wilehî li eskeriyê jî ne wilo bû. Quzelqurtê Reyis
heger zilamekî tebût baya, wê birêvebirên wî jî zilam
bana. Lê çi qasî yekî bêexlaq û bêbav li ku derê heye kiriye
mezinê me. Li ku derê dinyayê hatiye dîtin ku dewlet
bi kesên pêxwas û barûte çêbûne, ji bona şeytên! Ma ne ev
zigurdên wî ên ku îro em xistine qelaqê û îmana me çikandine,
di dawiyê de wê wilo bi serê wî de jî bikin. Tu siltanan
textê xwe bi telaqreşan, bêbav û santoran ne hevizandine.

Lê ew dihefizîne. Erê kuro, Zibêrê ku me newêrîbû
garan teslîmî wî kiribaya, Miho û Zibêrê ku Xwedê ew ji
bo xerabiyê xuliqandine, bûne mezinên me, haho!”
Bi çakêtê Mela girt, kişand û hîn bêhtir xwe zewirand:
”Bavê mino Mela, ma te şoreşgerên kwîr dîtine, hi?”
Mela devlikenî got:
”Na.”
225
”Lê li Cibigrawê yekî ku ji herdu çavan de hitime kirine
mezinê gund!”
Mîrzo keniya:
”Apê Heso, qey ji bo ku finasên wan nebîne ew kirine
mezinê gund, wey. Telebe bi aqil in. Ma qey hema her tim
ên ku bibînin divê mezinê xelkê bin, bila carina jî kwîr
bibin mezin. Mêrikan sosyalîst in ha!”
Heso piştî ku destê xwe hejand û got “heger sosyalîzm
wilo be, sosyalîzm tiştekî pîs e”, gotin anî ser rêz û edebê:
”Erê kuro, ez bavê bavê wan têm û ji min re dibêjin
‘heval!’ Dibê de were û kirasê xwe neçirîne! Ev çi kûçkaniya
ku me xwe pê girtiye. Van santoran urf û adetên me
bi carekê ve dane nav lingan. Hooweh! Apo, xalo, yabo,
yadê, metik, xaltîk, pismam, xwarzê, birazî hemû bûne
heval; de ji xwe re li vê ecêbê binerin!”
Vê carê jî bi pêşmalka Sarê girt, ber bi xwe de kişand
û got:
”Kuro ku ez ji vê re nebêjim jina min, wê çawa kî...ê
min lê rabe?”
Sarê jî piştî ku pê keniya û got:

”Bayê jinan li mêrik ketiye”, Heso bi pêxêla Kerîm girt
û hejand:
”Ma ku ez ji vî re birazî û ew jî ji min re apo nebêje, çi
tahm di jîn û jiyanê de dimîne?”
Şiqamek pê ve zeliqand û lê sor bû:
”Ê ne ez ê çavên te û bavê te derxînim ku tu jî ji min
re bibêjî heval! Hooweh li vê ezameta Xwedê, kesek nema
ji ber min radibe; zarokek bê çî ye min bi sila guyê xwe
nema dihesibîne! Erê, me nan bi guhên xwe ne xwariye,
civat bê manewiyet nabe...”
226
Heso mesele piçekî mezin dikir. Çekdar bi qasî ku bi
ser gundên derdorê Zorava û temamê herêmê de diçûn,
ewqasî bi ser zoraviyan de ne diçûn. Ji bilî Zorava li her
derê, zivistan ba, havîn ba, gundî li ser bênderan dicivandin
û bi wan re dipeyivîn. Bi wê tevgera wan, car caran
hin tişt in ne xweş jî derdiketin. Li gundê Pîrebokê şevekê
dîsa seet li dor yazdehê şevê gundî li pişta gund vehewandin.
Gundiyekî xwe di hindur de veşart û wan jî bi keleşkofan
êrîşî hindurê malê kir. Jina wî a li ser rojan qutifî û
zarok ji ber çû.
Sarinciyan dora gundê xwe bi carekê ve kiribûn tabî, bi
şev diketin van tabiyan û nobet li gund digirtin. Lêbelê li
Zorava tiştekî wilo tune bû. Li Menderê xewa bi şevê
qedexe bû. Bi roj jî her kes bi dorê radiza. Bamidiyan
kûçikên xwe hemû jehr kiribûn. Û li Zorava jî bi tenê
kûçikê Kenêr ji teref çekdaran ve hatibû kuştin. Kûçikê wî
bi rastî jî hinekî ecêb bû: Dema ku esker dihatin gund ne

direya, lê dema ku çekdar dihatin gund devê wî ne diket hev. Bi ser de jî bi dû wan diket. Partiyê li hin gundan bi zimanê tirkî pîr û kal perwerde dikirin. Û perwerdeya wan jî digel prensîpên partiyê, hin kitêbên Reyis û marksîzm û leninîzm bû. Li gundê Heso tiştekî wilo bi tenê di nav pîrekên navser, jin û keçên û ciwan de pêk hatibû. Piçûkmezin, temamê cibiltîniyan her roj seetekê talîmeke eskerî dikirin. Talîma wan jî bi tirkî bû.

Mela Salar di ber Heso re ne ajot:

”Tu rast dibêjî, gotinên te ji Quranê ne. Lê de ka em çi bikin? Bêsekin divê em van çewtiyên wan him ji wan bi xwe re û him jî bi haweyekî ji Reyis re bibêjin...”

Heso rê ne dida kesî, yek ji yekê pêdixist. Bêhna wî pir

227

teng bûbû. Di vê navê re heger hema yekî ji wan gotinek ne xweş bidaya ruyê wî, miheqeq wê tifa xwe tê werkiriba û heta belkî dev lê jî kiribayê.

”Erê şoreşger Mela, ma dibe ku hema her roj bi me ‘sixinaqan’ bikolin û bi me xerab bikin? Reyis bi eva ku zilamên wî dike dizane, dizane. Hemî bi wî dikin. Maka temamê xerabiyan Reyis bi xwe ye…”

Gava ku ji herêma wan çekdarek dihat girtin ya jî xwe teslîm dikir, esker dianîn ser sixinaqan û gundî didan girtin. Partiyê jî bi haweyê ku gundî cihê sixinaqan biguhêzin, tedbira alîgirên xwe distend.

Mela Salar dîsa mîna a berê got:

”Hemû jî bi aqilê xortaniya xwe tevdigerin. Her tim divê mirov ji wan re bibêje ku ev baş e û ew ne baş e.”

Heso destê xwe mîna şûrekî bi ser de hejand:
”Tu dibê qey tu ji çiyayê Qehf hatiyî! Ma sêwlekan dihêlin ku em devê xwe jî li ber wan vekin? Kes ji me newêre gotinekê ji wan re bibêje. Ew çi bêjin divê em bikin. Ji kuştinê, lêdan û bêerzkirinê pê ve bi mirov re nakin. Erê tu bi qedrê Xwedê kî, ji kerê belengaztir çi heye? Tiştek tuneye. Lê kerê dibînin berdidênê, kûçikan dibînin berdidin wan, qantir û bergîlan dikujin, bi qezetoreyan dikevin nav pezê alemê, dewaran di zinaran de werdikin, erê ma mirov pisîkan dikuje, lo! Li Stilîlê pisîk ne hiştin, pisîk! Hema çi dibînin li ser dikin. Terempêlan dişelihînin û dû re jî êgir bi wan ve dizeliqînin, trênan diqulipînin, xelkê di piskilêtan werdikin, beraz in beraz!...”
Mela vê carê jî bi haweyê ku hinekî dilê wî xweş bike: ”Wilo ye heval”, got û ji her kesî bêhtir ew bi gotina
228
xwe keniya.
Reyis peyvika ”heval” di nav çekdarên xwe de wek mercekî partiyê danîbû. Lê piştî ku çekdarên wî di herêmê de tam cihê xwe girtin û bûn serdestên gundiyan, merc li gundiyan jî serast kir. Di eslê xwe de tu ferqeke wilo ber bi çav di nav gundiyan û çekdaran de hema hema ne mabû. Heta bi piraniya bajariyan jî. Cilên wan û gundiyan bi giştî ji yek qumaşî bû. Gundiyê ku tu carî çefî li serê xwe ne dipêça bi çefî bû. Herdu hêlan jî solên meqabê bi kar dianîn. Şerab û bîra ku çekdaran nikarîbû vexwara, li ên bajarî jî qedexe bûbû. Futbol bûbû qaçax; taxim hemû

ji hev belav kiribûn. Dama û satranc ji odeyên gundan û qelemaç û bîlardo jî ji qehwexaneyan rabûbûn.
Dîsa rojekê Heso wek niha xwe aciz kir. Bi Qaso, Kerîm û Sêdiq re, di ser qayişa çekdaran re bi ”ûçiliyan”lîst. Piştî ku çekdar jî li meselê hayî bûn, her yek ji wan bi sê sed hezarî ceze kirin. Hemiyan jî perê xwe dan.
Kenêr peyivî:
”Seyda, çewtiya ku dikin xwezîka ji ber nezaniya wan filan baya. Çewtî nabe kar, lê wan ew çewtî ji xwe re kiriye kar û emel. Gotin nema ber digire, ezbenî. Zavê şerbikê bûkê şikenandiye û zarok li ser şekir civiyane. Aş xerabe ye û hûn jî bi dû teqteqa lûlik ketine. Her tişt bi zanahî tê meşandin. Kuştina heywên û zarokên pîberan ne qeze ye. Her roj dikujin. Îcar tew li aliyê Torê dest bi talankirina milk û malê dewlemendan jî kirine. Heso, hebûna herî bêrûmet ji tunebûnê çêtir e. Bi çi haweyî dibe bila bibe li xwe biqewimînin da em hemû winda nebin. Heger wilo biçe em ê hemû têk herin. Û wê wilo biçe jî.”
229
Erol Efendî keserek kişand. Mirov digot qey tiştên ku wê bihatana serê wan, yek bi yek di ber çavên wî re derbas dibûn. Di keft û lepta wî de dida der ku ûjdanê wî ne rehet bû. Gava ku serê xwe radikir û dipeyivî çavên wî wek du tasan fireh dibûn û dilîstin.
”Ax Kenêr ax! Ji serî de dibû, lê îro pir zor e!
Li gora Reyis tiving di ser her tiştî re bû; kirin ji gotinê mezintir û kuştin jî ji saxhiştinê çêtir bû. Şer sîlehê herî

mezin bû; şer çiqasî berfireh bûba Reyis jî wê ewqasî bi hêz bûba û di dawiyê de jî wê xwe pêxember ilan bikira. Em hemû hatin xapandin. Em hemû bûne hevalên xeraban û ew hevaltiya me a bi xeraban re, exlaqê me jî xerab kiriye. Gotineke pêşiyên kurdan heye dibêjin, ’hevalên xeraban jî xerab in.’ Xerab nikarin li hev amin bibin û bi hev re bimeşin. Kes ji me nema dikare xwe tevbilebitîne. Heta ku ev şer hebe him em ê nikaribin yekitiyekê di nav xwe de deynin û him jî Reyis wê ji her kesî xurtir be û devê me hemiyan jî biçirîne.”

Sara ku êş û cefa herêmê di ruyê wê de civiyabû û mîna xelatekê di nav wan de sekinîbû, bi keder li Erol nerî û bi keder jî got:

”Hûn mirov ditirsînin. Ma hûn dibên ev zarok bi Reyis vê çavsoriyê li xelkê dikin?”

Erol Efendî bi haweyê ku tam têxe serê wê li Kenêr nerî û dest pê kir:

”Bêguman tiştekî mikemel tuneye. Di her tiştî de kêmzêde wê hin qisûr hebin. Di siyasetê de jî wilo ye. Lê a ku ên me dikin ne ew e. Mirov dikare çewtiyê û heta çewtiya ser çewtiyê bi qisûr û kêmaniyên cahiliyê ve girêbide û xwe di ser xeta cot re biqevizîne, lê gava ku çewtî bû kar

230

û emel, wî çaxî jî mirov jê re tiştekî din dibêje.”

Mela Salar fêhm ne kir:

”Hinekî vekirî bibêje, em hîna ewqasî ne bûne alim, heyran.”

Erol tena tena got:

”Yanî mirov ji vê çavsorî û berîberdaniya şervanan re, siyaset dibêje, ezbenî. Siyaseta wan ev e. Kî vê siyasetê datîne? Reyis. Kî vê siyasetê dimeşînin? Şervan. Û em jî bûne benê dû hebanê. Gava ku şervan li Xirbêqeployê li dor hezar pezî bi qezetoreyan bikujin û ev kuştin li Torê, Omeriya, Xerza, Botan û hêla Colemergê ha ha dewam bike, mirov jî ji eva wan re siyaseta pezkujiyê dibêje. Her roj mîna esker û tîman digrin ser gundekî pîberan û zêc û zarên wan dikujin. Mirov ji vê re siyaseta zarkujiyê dibêje.”

Mîrzoyê Mitirb bi şida destê xwe li erdê xist, kenekî lib libî kir û got:

”Apê Heso, bi telaq eva ku nahêlin ez li ribabê xînim jî siyaseta kîrpûçkirinê ye!”

Ji destê wan pir kişandibû û hîn jî dikişand. Ribaba wî bûbû bela serê wî.

Rojekê kufletê xwe şand Sirêçkê û di êxur de daweriqand ribabê. Lê di ber de hiştin. Çekdarên ku li mala cîranê wî rûniştîbûn, xwe li dengê wî girtin. Û Mîrzoyê ku xwe lê berdabû û mişk û maran li derdora wî cirt vîtk diavêtin, qepace girtin. Ribab perçe perçe kirin û bi ser de jî çend kulm li argûşkên wî xistin. Bi vê lêdanê diranekî wê î kursiyan şikest. Lê wî jî li ber xwe da û got:

”Ma lawo gava ku em bi dengê stiran û ribaba xwe, vî xelkê beredayî serxweş nekin, wê ev xelk çawa karibe

231

bi...ute hev û zarokan çêbikin!...”

Çekdaran qiyametek pere jê stendin. Li qirdê wî ku

mîna ê midyadî hema ne kuştin.
Erol Efendî piştî ku got ”tu rast dibêjî Mîrzo” û keniya,
Kenêr bi haweyê ku mijara wan belav nebe peyivî:
”Lê Erol Efendî, ma mirov nikare wan berde hev jî
qey? Ka em çendekî jî serê xwe bi vê yekê jî biêşînin.”
”Mirov nikare eskeran têxe pêxêla hev ezbenî; hemû jî
esker in”, Erol got û hemiyan bi hev re li qelebalixa navtarê
nerîn.
Etar hatibû gund. Pîrekan kongreya ku ji mehê carekê
li dar dixistin nêvcî hiştibûn û bi ser etêr de beziyabûn.
Meyroyê dimilmilî û dihat. Heso pê keniya:
”Hevala Meyro, îcar di vê kongreyê de hûn ê kê bikin
başqan û sekreter?”
”Apo, sorimliya partiyê dîsa dixwaze jina Apê Zibêr
bike beşqan û a Miho jî bike serketêrê wê. Lê bi Xwedê ez
oya xwe ji wan re qullanmîş nakim.”
”Ma ji bilî wan tu aday hene ku tu oya xwe atmîş bikî,
xanimcik?”
”Na apo...”
Qêriya:
”Keçê wê wek jina Seyidxanko te jî yaqmîş bikin! Ma
qey tu jî dixwazî Temo berdî?”
Jina Seyidxanê sarincî di kongreyekê de li himberî
mezina partiyê derketibû:
”Hilbijara me bila hinekî li ser heqiyê be. Qet nebe
hema bila bişibe a muxtariya gund”, gotibû û çend kes
pêşniyar kiribûn.
Mezinê jî bi mebesta ku Şemê hîn partî nas ne kiriye,

di hindurê hevteyekê de ew şand ba Reyis. Piştî çar-pênc mehekî, Şema xwedî sê zarok li gund vegeriya; gundî li ser bênderan civandin û bi haweyê ku mêr bi jinê re dikir, mêrê xwe berda û derket çiyê.
”Xwedê neke apo!” Meyroyê got û serê xwe berda ber xwe.
Mîrzo bi rengê ku Heso lê sor bike niqirand: ”Hevala Meyro, ma ew kitêba jinan jî ji we re ne xwendin?”
Partiyê ji mehê carekê bi navê ”Dengê Jinan” bi tirkî kovarek derdixist û berpisyarê jî kovar ji wan re dixwend. Kesî jê fêhm ne dikir lê wê dîsa jî dixwend. Reyis wilo emir kiribû û heta ji wê û temamê çekdarên xwe re jî gotibû ku divê hûn gelê kurd di wextekî pir nêzîk de hînî tirkî bikin da ji wî mejiyê bav û kalên xwe ên genî xelas bibin; wan hînî tirkî bikin da bikaribin maqûl bifikirin...
Heso xwe dîsa zivêr kir, bi destê Mela Salar girt û hejand:
”Erê çi karê mêrik di nav jinan de heye Mela? Ma li gora dînê islamê ne guneh e ku zilamek di nav pêncî pîrekî de rûne, yaho?” Heso di kovarê de gelek caran Reyis di nav pîrekan de dîtibû.
”Him mekruh e û him jî tiştekî ne maqûl e”, Mela got û ruyê xwe tirş kir.
Miho û keça ku mezinahî li jinên wan dikir, ber bi wan de dihatin. Sêdiq mijar guherand:
”Howeh Apê Heso! Wan xazozên berê agir bi bêvila mirov dixist. Lê ên îro mîna avê ne, qet bêvila mirov naşewitînin.”

”Kuro namûs bi me re ne maye; ji ber vê yekê bêvila me nema dişewite, ehmeq!”

233

2

Çekdaran bi sebeba ku bêşa partiyê bidin hev, gundî li odeya Heso civandin. Bi tenê Meshûd ne hatibû. Ma wê çawa bihata? Çend roj berê mêrik li ber çavên her kesî mîna kerê zirandibûn. Lawê wî ê teredînî li ser navê partiyê ji dikandarekî nisêbînî sed hezar wereqe stendibûn û pê çûbû ser doktor. Her tim qarçikî bû. Çekdaran jî tevgera lêwik bi bavê ve girêdan û di hoperlorê de li ser bênderên binya gund, tam deh deqîqeyan zirandin. Li Bamidê jî pazdeh deqîqeyan Zîzo mîna çêlekê orandin. Di wê gavê de Zîzo ji wan pir xwest ku mîna gê biore, lê qebûl ne kirin. A wî jî li ser ku çima keleşkofa xwe ji wan xwestibû. Zîzo bi pereyên himaliya li Izmîrê di sala 1984an de, ji xwe re keleşkofeke çînî kirîbû. Çekdaran jî bi destbihartî û bi hesabê çend mehekî keleşkof jê xwestin. Da wan û pîştî pênc salan doza keleşkofa xwe li wan kir. Çekdaran ew yeka han bi xwe ne xweş anîn û mehkeme lê vekirin. Mehkema ku ji wan pêk dihat, keleşkof wek malê Kurdistanê qebûl kir û bi ser de jî erza wî şikenand. Lê Zîzo netebitî û dev ji malê xwe berneda. Di dawiyê de bi haweyekî doza xwe gihand mehkemeya bilind ber destê Reyis.

Bi kurtî, Reyis jî cezeyê ku di hoperlorê de bibêje ”min gû xwar” dayê. Di hoperlorê de wilo got. Lê dîsa jî ew efû ne kirin. Bi dû barê êzingan de li çiyê kuştin.

Meshûd jî anîn.

Xelef berî her kesî xwe avêt nav dahfikan:
”Birayê min wilehî ji min nayê ku ez pênc milyon pere bidim. Îsal sala me xerab derbas bû, baran nebariya. Ji
234
çandiniya me bi zorê qûtê me hatiye. Nenûk tune nin ku em xwe bixwirînin; û bi ser de jî ji hew bêhtir deyn li min in. Îcar em ê çawa ewqas pere bidin we?”
Serokê eşîra bûblaniyan Şivanê nozdeh salî bi herdu destan keleşkofa xwe hişk zeft kir, qûndaxa wê bi erdê ve tiktikand û bêyî ku aciziya xwe bide der tena tena got:
”Niha berî her tiştî ez ne birayê te, ez hevalê te me heval. Partî bi her tiştê we dizane. Yanî pê dizane ku her sal piştî hilanîna bênderan lawê te Loqo bênderê dike pere, diçe Stenbol menbolan û pereyên xwe hemî li pavyon mavyon û tirekiyan xerc dike.”
Loqoyê devkeçikî bi xwe ne xweş anî:
”Heval ne wilo ye. Temamê bireka me bi rastiya wê bûyerê dizanin. Du sal berê li ser gotina Birkê sarincî ku li nav tirkan mezin bûbû, bi sebeba ku ez û wî em otêlekê ji xwe re bikirin em çûbûn Adapazarê. Lê Birkoyê pêxwas û hevalên xwe ez xapandim û perek merekên min hemû xwarin...”
Bi van gotinan mîna ku tu şivekê li bêvila Şivanê batmanî bixînî, sor û moro bû:
”Tu çawa dikarî wisa bêjî, ma qey partî derewan dike?”
”Haşa! Ez binê şekala partiyê maçî dikim, lê heval mesele wilo bû.”
”Na na, partî derewîn e, bextreşî û telaqreşiyan li we

dike”, got û destê xwe dirêjî bêrîka çakêt kir.
Piştî ku qelem û defterka xwe derxist û wilo got:
”Ez ê vaye binivîsînim û tu û partiyê li hev”, Mela
Salar peyivî:
”Hevalê me Loqo û Şivan herdu jî rast dibêjin. Ew
Loqo ne ev Loqo ye. Loqoyê domizî bû ew. Mêrik her sal
235
piştî hilanîna bênderan diçe Stenbolê û perekên xwe hemî
li devê qehbik mehbikan diqelibîne...”
Her kes di bin simbêlan re bi derewa Mela keniyan. Lê
Mela jî lawik ji beleyeke mezin filitandibû. Şivan mecbûr
mabû ku di derbarê wî de raporê nenivîsîne. Meqbûs
nivîsand.
Raporên wan dijwar bûn; her tim ya bi curmê û yan jî
bi kuştinê encam didan. Rapor diçûn ber destê komutanên
herêma Mêrdînê û ji wir jî digihan ber destê Reyis. Emirê
çekdaran û kuştinê tune bû. Heta komutanên herêman bi
xwe jî nikarîbûn biryara kuştina hevalekî xwe yan jî gundiyekî
xuyayî bidana. Kuştina endaman û kesên xuyayî
rastûrê bi Reyis ve girêdayî bû.
Aytena ku Dodoyê stilîlî ew bi her kesî dabû naskirin û
dû re jî reviyabû Ewrupayê, bi hev re li pavyonên Izmîrê
kar kiribûn, bi tirkî peyivî:
”Hûn nikarin li himberî Reyisê ku em hemû xuliqandine
û partiya wî bêedebiyan bikin. Bi rastî jî ev mêrê kurd
serhişk e. Divê mirov serê wî di nav destê xwe de tam bieciqîne
û li pişta wî xîne. Serê kurdan ji kevir jî hişktir e, tu
çi dikî jê nerm nabe, yaho!”

Ayten keçeke kurd bû û du salekî di pavyonan de kar kiribû. Tirkiya ku hîn bûbû hemû jî di vî warî de bû. Cîgira Şivên bû. Gundiyan ji ber bêvila wê a şerbikî û lêvên wê ên ku bi qasî ên ebîdekê qalind dihatin, navê wê kiribûn ”Togê.” Ew jineke çist didîtin.

Qadoyê ku di tiyatroya şeva din de dîsa bûbû esker û hêsîr ketibû nav lepên çekdaran, bi telkî rûniştibû û lingê xwe radabû, bala Şivên kişand:

”Bêterbî ye, wek camêran rûne!”

236

Bêyî ku tiştekî bibêje, bi lez xwe da ser hev. Qado pir lêxistin xwaribû.

Çekdaran ji hevtê carekê tiyatro çêdikirin û her tim jî rola herî pîs didan vî Qadoyî û çend kesên di tayê wî de wilo girs. Carina ew dikirin general, ew hêsîr digirtin, lê siwar dihatin û pîvaz pê hûr dikirin. Carina ew dikirin cahş; di şer de piştî ku teslîm digirtin, îcar bi beyikan laşê wî reş û şîn dikirin.

Carekê jî Qado bûbû tîm û Miho jî bûbû çekdar, Qado Miho hêsîr girtibû û ew digurand. Îcar tam di wê navê re çima qefleke çekdar wî zeft nakin. Çekdarek hema yek ser keleşkofê li ser dike. Ji mirinê filitîbû. Gule tam di ber guhê wî re firiyabû.

Xelef piştî fêhm kir ku di meqbûsê de deh milyon hatine nivîsandin, bû xwê û kete êgir:

”Erê kuro ev niha hûn nayên em herin heqiya Xwedê? Birayê min, ez erdê xwe bi pênc milyonan difroşim we, ma hûn vê jî qebûl nakin, weh! Em ne xwedî erd, em cîranên

we, em ê bi nan û zikê ji we re bixebitin, me erd navê...”
Şivanê ku xewa wî lê biribûn hêrs bû. Çavên xwe ên ku bêsekin diqurmiçandin firkandin, qûndaxa keleşkofê li ser hev sê-çar caran li erdê xist, diranên xwe qîç kirin, dest bi nivîsandina raporê kir û got:
”Tu zêde zêde zimanê xwe dirêj dikî, heval! Dema ku te li himberî me tenqên dewletê bazar dikir, gerek wî çaxî partiyê devê te tije gule bikira. Mereqan neke, wê bike. Serê we piçûk e, hûn nikarin mezin bifikirin. Dengê xwe neke û deynê xwe bide û hew!”
”Ma tu emir li me dikî bavê mino?” Xelef got û ziq li
237
herdu çavên wî nerî.
”Na. Em minaqeşeyê dikin. Emir piştî stendina biryaran tê; bes bipeyive!”
Circîs di kêleka Heso de mîna keftarekî bêdeng rûniştibû, xwe tevda. Heso ziqitandê. Sekinî. Erol Efendî serê xwe berda ber xwe. Sêdiq darikê xwe di erdê de bir û anî. Mela Salar li Kenêr bi hêviya ku tiştekî bibêje nerî. Mîrzo pala xwe da dîwêr û bi herdu destan ruyê xwe firkand. Hûto jî li nav şekalan rûniştibû; bêxem car carê ruyê xwe tirş dikir û ji xwe re bi aqilê wan dikeniya.
Di salên ku telebeyan xwe berdabûn nav xelkê û partiyên xwe ava dikirin, esker û polîs jî hinekî mêşinî bûbûn.
Çavên xwe ji wan re digirtin. Xelef jî wê yeka han wek firseteke mezin dibîne û rojekê xwe berdide Nisêbînê ba nobedarê tenqa ku li binya tabûrê her tim sekinîbû.

”Birayê esker, ma tu vê tenqê nafroşî min?”
”Tu ê çi bikî ji vê zir tenqê, apo?”
”Wile lawo, zarokên me dixwazin dewletekê çêbikin.
Û tu dizanî ku her çi dewlet e jî bê tenq û top û teyare
nabe.”
Ê esker jî piştî ku çixareyekê dide dest û çeqmêq li ber
pêdixîne:
”Apo, de ka here pêşî teyarê bikire, bi soz ez ê jî wî
çaxî tenqê belaş bidim te”, dibêje û ew û Xelef xatir ji hev
dixwazin. Hemû ewqask bû.
Şivên bi kelgermî meqbûs ha ha dinivîsandin, dida dest
Zibêr û Zibêr jî dida dest gundiyan. Du babet meqbûs bi
kar dianîn: Di yekê de nav hildida û di yekê de jî nav hilnedida.
Remo li telê xwe xist:
238
”Heval te di meqbûsa min de nivisandiye ku ‘kurdekî
welatparêz du sed hezar da.’ Ma wilo dibe, tu çima navê
min nanivîsînî?”
Xwe beşişand, lê ne ji dil bû.
”Partî mirovê heta ku pênc sed hezarî dide jî navê wî
nanivîsîne”, got û awirek tê firand.
Remo devê xwe dagirt, lê wî rê nedayê:
”Guhdar bike! Dema ku çawîşê Stilîlê her sal bi kêmanî
bîst milyon diavêtin ser gund, bê minaqeşe we dida. Lê
gava ku em çend qurûşekî ji we dixwazin, hûn xwe diberizînin
me. Ji bîra nekin ku ji cendirmeyekî re we beran
digurandin.”
Heso piştî ku serê xwe ê perixî ji xwêhdanê paqij kir û

beşişî:
”Yabo heval, bi şêxê erdê li Bexdayê xebera te ye. Ma mirov di vê kelkela germa havînê de tilîşewitiyê dide mêhvanên xwe! Ji min re jinek lazim e”, got û taseke av xwest.
Sara ku çekdar bi qinê gwîzan, helîla hingiv û goştê kahr û berxan xwedî dikirin, firavîn dims û nan danîbû ber wan. Di eslê xwe de Sarê xwestibû meyirê bide wan. Lê hevalê Şivanê ku serokê eşîra omeriyan bû, li Cibigrawê pehîna xwe li sêniya dimsê xistibû û perçeyên nên bi vir de û wir de avêtibûn, bêhna Sarê teng kiribû. Sarê ji bo ku wan aciz bike, dimsa kelandî, ew jî bê hêk, û du-sê nanên qet qetî danîbûn ber şeş-hevt kesan. Bi ser de jî Hesoyê ku hîletê wî ji dimsê diçû, hema hema firavîn hemû xwaribû. Kenê Heso ji çavên çekdaran ne reviya. Yek ji wan li ber xwe ket. Di ruyê wî ê qurmiçî de wilo xuya dikir.
”Hevalê Heso, di malê de qey ew xwarin hebû, hewce
239
nake tu xwe aciz bikî. Xelkê me ê zilam ji xelkê me ê pîrek bêhtir geriyaye û dinya dîtiye. Divê mirov hinekî bi sebir be û hevdu hînî kultura partiyê bike.”
Kenêr bi haweyê ku wan xwe bi xwe berde hev peyivî:
”Hevalê hêja, min bibexişîne, ma gelo ez dikarim bipirsim bê te kîjan unîversîte qedandiye?”
Hema yekser:
”Min ortaokul sinifê duduyan qedandiye.”
”Lê tu wek yekî unîversîteyî xeber didî.”
”Rast e heval, min pir kitêbên heval Lenîn û Stalîn

xwendine. Heta ez karim bêjim ku min kapîtala heval Marks cildê nehan jî qedandiye.”
”Xuya dike ezbenî”, Kenêr got û serê xwe berda ber xwe.
Şivên ne hişt ku hevalê wî gotinê bidomîne. Destê xwe lê hejand:
”Heval devê xwe bigire, em karekî dikin!”
Hevalê wî nema peyivî.
Di vê navê re usteymenê hidûd Mehmet Bîçerê bîst-sîh sal berê hatibû bîra Heso. Xwe şaş kir:
”Ma ez dikarim tiştekî ji te re bibêjim qomandarê min”, got û xwe bi ser hev de guvaşt.
Komutên jî dar di zikê wî rakiribû û jê re gotibû ”bibêje!”
Lê Şivên destê xwe lê hejand:
”Qomandarê çi!”
Baş bû ku Qaso xwe di wê navê rakir û mîna parsekan peyivî:
”Hevalê min ê herî delal, divê tu ji min bawer bikî, ez bi serê heval Reyis sund dixwim”, zimanê wî şehetî, ”ji
240
sed hezar wereqeyên min pê ve pere li mala min peyde nabin. Ji min nayê ez milyoneke pere bidim. Ez bi çaboxka erdê ku Apê Heso daye min û bi nanê wî, kufletkê xwe didebirînim.”
Şivan bi gotina wî re tam bû şivan û bi wê navê de pijiqî:
”Belkî hezar carî me ji we re gotiye ji Reyis re nebêjin heval. Ew ne heval e. Wî em xuliqandine!”

Dû re jî:
”Gava em êgir bi keleşkofê dixînin, bi tirîniyekê
bihayê sed hezar wereqe fîşekên me diçin. Û tu jî bi dû
milyonekê ketiye”, got û bi hinc destê xwe li erdê xist.
Circîs jê gihabû bêvilê. Heso rê nedayê. Destê xwe
hejand û heta ku jê hat dengê xwe hilda:
”Erê lawê bavê mino, tirîniyê bi keleşkofê nexînin,
yeko yeko berdênê, weh! Waweyzê, van av di hestiyên me
de vexwar, em nema dizanin bê em ê ji ber we bi kîjan tahtilerdê
de bicehemin! De ji xwe re li keleşkofka wî, defter
û qelemka wî, qamka wî, qûnka wî binerin bê çi bêterbiye
ye! Zû rabe ser xwe û ji mala min derkeve, sêwlekê
heram!”
Zibêr hilda xwe û bi lez ber bi devê derî de meşiya.
Heso qêriya:
”Hûto binere bê tu çend parsûyên wî teresbavî naşikînî!”
Civat hemû bi wan ve rabû. Çekdar jî. Hûto Zibêr di
nav lepên xwe de kire wek gilokeke rês û di derî re firand
hewşê. Zibêr du-sê teqlan di ser hev re qulipî. Rabû ser
xwe, li paş xwe nerî û mîna kûçikê ku ji dengê tivingan
bitirse li xwe xist û reviya.
241
BEŞÊ DUWAZDEHAN
1
Top. Doçk. Sarox. Bombe. Arpicî. Metilyoz. Qenas.
G3. Keleşkof. Qir û seqem. Pûka berfê.
Perçeyên goştê insên li hewa dilîzin. Cokên xwînê
diherikin. Cendek cendekan dixijiqînin. Birîn mîna devê

kewaran vebûne. Bêhna goştê kizirî û barûdê hawêrdor difûre. Dengê qîr û navtêdanên mêrkujan di binê newalan de li hev dizîvire û di rûbarên çiyan de li hev vedigere. Çiya dihejin, agir ji tahtan diçin, lat di ser serê hev re digindirin. Qîr û qiyamet e!
Du helîkopter ji gundê Herbê, pênc jî ji Nisêbînê firiyan. Ên ku ji Herbê firiyabûn berî ên din çekdar keşif kirin û bi saroxan raserî wan hatin. Lê helîkopterên din hîn deşt derbas ne kiribûn çekdaran jî ji ser pişta çiyê li wan girêdan. Yek jê bi xezeb hat. Çekdarekî kozik berda; hilkişiya ser serê latekî mezin û ew û helîkoptera ku ji aliyê bakûr ve mîna başokeyekî li hewa dilîst li ber hev herimîn. Helîkopterê lê xist. Perçe perçe kir. Sê çekdarên din jî ji cihê xwe firiyan. Ji hev belav bûn; yekî xwe da ber dara berû, dareke kevnar bû, ên din mîna ev ê berî niha kirin û bi arpiciyan li ber helîkopterê veteqilîn. Ji pişta çiyê mîna baranê li van reşandin. Hersê jî kuştin. Ên li ser doçkê jî. Çelo di nav xwînê de gevizî. Çekdarek pê ve rabû. Ew jî li erdê veziliya. Serdêr ji hindama şikeftên Rişwanê dîsa nav di xwe da. Vî her tim wilo dikir. Pêl li koma wî ket. Di vê navê re jî hin hatin kuştin. Lê wî wek pilingekî xwe bi erdê ve xijiqand û xwe çeng kir ser doçka Çeloyê birîn-
242
dar. Wî berda helîkoptera ku ji aliyê Nisêbînê ve dihat. A li rohilatê wî ew ferq kir. Wî dev ji wê berda û bi eva din daket. Lê xist. Helîkopter li hewa gêr bû. Ji dixana wê xuya dikir ku gule li dapoya benzînê ketibû. Lê wî dîsa li ser hev berdayê. Xurt hate xwarê. Teqiya. Hema bi dû vê

de yek jî ne giha erdê û perçe bû. Bi xistina wan re herpênc helîkopterên din bilind rabûn û ber bi Zorava de dageriyan.
Reşoyê ku li Zorava bi hevtê û çar çekdarên xwe ve rûniştîbû, zû bi xwe ve giha. Li hêviya şerekî wilo ji xafil de bû. Çekdarên xwe ên şîretkirî bi destpêka hingamê re komik bi komik ji hev belav kirin û ber bi çiyê de beziyan. Serdêr bi dûrbînê li wan temaşe dikir. Giraniya xwe berdabû ser wî û bêwestan li cemseyên ku ji aliyê Qesra û Dêrê ber bi çiyê de dikêşiyan, girêdabû. Lê tabûra Herbê eman ne didayê; ketibû paş wî û top li ser topê diavêtêyê. Helîkopteran di diyarê Sadan de xwe dadan Reşo û tîmê pê re. Serdêr avêt wan. Yek bi qahr li wî vegeriya. Ronî ji ser hewdên Birxulan li xwe qewimand. Bi wî hisiyan. Dudu jê qederekî bi hev re bilind bûn, ji nişkê ve ji hev qetiyan û mîna başokeyan bi wê navê de herikîn. Dû re jî yek li ser Sirêçkê, a din li ser Zorava wek du teyran sekinîn û ji wir berdan Ronî.
Reşo bi bayê saroxê re di ser hev re qulipî. Vir mehsera qelêç bû û her der mîna kefa destê mirov vekirîbû. Li vir çend kes ji wan hatin kuştin. Ji hev belav bûn. Çaran jê xwe qulipandin ser piştê, wek qûçê sekinîn û berê sîlehên xwe dan ezmên. Lê Reşo mîna mêr veziliya û bi ser lat û zixuran de herikî. Menca ku dabû kêlekê jî wek wî kir. Bi
243
aqilî fikirîn. Xwe ji sirtê berdan û ji Kunhevtarê heta bi nêzîkî Hatxê berpalên qelaçan zeft kirin. Heger Reşo ji moral ne ketibaya, miheqeq ji serî de jî wê ev yeka han

kiriba. Li gora wî, di şeran de moral ji bo komutên û şervên sîlehekî mezin bû. Li ber xwe ketibû. Çend hevalên wî ên hêja ne li ser tiştekî hêjayî, pîsî pîsî hatibûn kuştin. ”Ma mirov bi ewqase zilam xwe berdide çol û beyaran ehmeq?” Heso jê re gotibû. Xwe berdabû carekê, ji dest çûbû. Lê dîsa jî a hîn ji vê mezintir hebû. Koma wî a giran li ser lingan bû û bi çekên mezin rapêçayî bûn. Hemû jî qert û di şeran de pijiyabûn. Tew bi ser de jî Serdar hatibû hewara wî. Temamê kolordiya Diyarbekirê bi qêriya dîsa jî wê nikarîba bi wan. Lê bi wê bêmadiya xwe helbet wê nikariba serî bi menqek esker re jî derxistibaya. Ne wextê ponijandina siyasî bû. Him li ser daxwaza serokê partiyê hatibû gund. Reyis ew mecbûr kiribû û gotibû ku gundî divê qeweta partiyê bi çavên serê xwe bibînin. Qirdê wî hebû ku bi bêtêlê gotina Reyis gihandibû Serdêr. Sûc bû. Reyis bi kê re bipeyivya gerek gotina wî derneketibûya. Mercekî partiyê bû ev. Li vê yeka han hîç ne difikirî. Menca lêvtenik bi destê wî girt, hejand û bi ser de hil bû:

”Reşo Reşo, ev çi bi te hatiye? Tu ne li ser hişê xwe dipeyive! Heval li gora xwe dilivin; wisa nabe em ê hemû bên kuştin!...”

Bêdeng hilmekê li herdu çavên wê nerî. Sarê hate bîra wî. Çavên wê jî mîna ên dapîra wî şîn bûn. Ax ku Sarê di vê bêhnikê de li ba hazir ba û dengekî jê re bilîlanda! Dikarîbû di pişta gundê Qûzo re xwe bigihanda stukura Şêxbat, li xwe bikira şev û tabûra Herbê di navbera xwe û

Serdêr de hêsîr bigirta. Lê Sarê erza wî şikenandibû û jê re gotibû ”kûçik lawê kûçikan, qey xwîn rijiyaye çavên te ku te di vê navrojê de xwe berdaye gund! Zarokên xelkê hûr in...”
Xwe aciz kir:
”Ne sûcê min e!” got û hewayî du fîşek berdan.
Bêvila wî ji zixurên guleyê topa ku li nêzîkî wan ketibû bi xwîn bûbû. Mencê zendika xwe da ber. Zendik hilanî û danî. Xwîn ne disekinî. Geft lê xwar û bi hêrs peyivî:
”Sûcê te ye. Te evqas heval dan dû xwe û te em anîn gund. Îcar vî sûcî li xwe giran neke, xwe bide ser hev!...”
Zingînî li ber guhên wî ketibû. Serdêr ew di neqebên Hepsa Darê de girtibû. Hîn bêhtir fikirî. Çi qasî fikirî xwe ewqasî jî aciz kir:
”Ez çewtiyên wilo mezin nakim; çewtî a...” got û dev li serê zimanê xwe kir.
”Helbet çewtiya te ye! Komutanê herêmê tu yî!...”
Ji aliyê roava de mîna baranê gule bi ser wan de dibariyan. Sarox bi giştî di serê sirtê de diteqiyan. Top li newalê diketin. Di vê navê re jî Serdêr bi bêtêlê têkilî pê re danîbû û bi wahc digot:
”Ji wir derkevin, ji wir derkevin!...”
Lê wê çawa ji wir derketana? ne digot.
”Ewqas ji destê min tê! Fermo, hemû di emrê te de, îdare bike”, ji Mencê re got.
Kom li ser serê wî giran bûbû. Bi dehan cemse û terempêlên sivîl ji aliyê Sarincê ve, di ser rêya Petrolê re kişiyabûn guhera Mexelan û ref bi ref bi ser de diqulipîn.

Heger ji serî de çend komikên xwe di qelaçên Sirêçkê de bi cih kiribana, belkî bi qasî niha lê teng ne baya.

245

Menca ku cîgira wî bû ne li bendî bersiveke wilo bû. A wê ne ev bû. Çav lê fireh bûn û xwêziya wê di ber de ma. Jê daxwar, bi xweşî çûyê û pîrekî jî peyivî:

”Ma min ew Reşoyê gurê şevên reş û tarî veşartiye ku ez emir têxim destê xwe?”

Reşo mîna gulekê vebû. Xwe bêhnekê Reşoyê Darî û Mencê jî wek jina xwe dît. Bi destê wê girt û guvaşt û hema di cih de jî berda. Destê herduyan jî diricifîn. Bi kêf piştî ku ”li mijê binere!” sivik sivik eniya xwe firkand, ”Bahoz, Sîpan, Cûdî zû zû! Bi hevalên xwe ve derbasî qelaçê pêşberî me bibin”, got û wek tîrê ji cihê xwe firiya. Menca ku pê ve bûbû wek mêşê û xwe jê bernedida, çawa da dû wilo jî kumişî. Wî guh nedayê. Bihata kuştin jî lê venedigeriya. şêla wî ne a vegerêbû. Serketina şer bi saniyan ve û qedera hemiyan jî bi wî ve hatibû girêdan. Jê re li hev hatibû. Xeta herî piçûk dawî li jiyana gişan dianî. Hewrên qutqutî ji hev belav bûbûn; mija ku girtibû çiyê bi ser wan de diherikî, di neweladê de diciviya û bi lez bilind dibû.

Çekdarên ku çavên wan hînî reşayê bûbûn, di nav mij û moranê re bi yek bêhnê re xwe avêtin pêş; bi sênga qelêç ve hilkişiyan û di nav xiraman de çong berdan erdê. Serdar jî di sulûmê çiyayê Kurê de sekinîbû û bêwestan di ser serê Reşo re li sirtên Dojderê, Kumberê û guhera Mexelan girêdabû. Temamê helîkopteran jî di qada şer de fik kiribûn.

Pişta Reşo li tahtê bû. Serdar wek çiyayekî li pişt
sekinîbû. Ji paş wî ve çûk nikarîbû di ser re bifirya.
Pazdeh-bîst deqîqe ne ketin wê navê ro derket û eskeran
mîna refên xazik û zerzûlan ji wan xuyanî kirin. Tam
di vê bêhnikê de Reşo pişta dijminê xwe şikenand û li şer
246
bû hakim. Alî bînbaşî jî piştî ku bi dehan kuştî û birîndar
dan, serê eskerên xwe ragirt û bêsekin çend bêhnikan agir
bi tematêk û metilyozan xist. Van ên din jî bi haweyê wî
bersiv dan. Şer sincirî û çiqasî çû agir bi car û newalan ket.
Di eslê xwe de heger ne ji hin eskerên mêrxas bana, belkî
şer ewqasî germ nebaya. Ne ditirsiyan. Wan jî nav di xwe
didan û mîna guran xwe ji ber vî latî çeng dikirin ber latê
din. Herdu aliyan çarhawêr dan ber hev û sênga bi sênga
ber bi hev de qedimîn. Mirov digot qey şerê kurmanciya
kevin bû, ne tirk û kurd, kurdan xwe bi xwe li hev dixistin.
Eskeran ford û zirtên xwe li wan û wan jî ford û zirtên
xwe bi eskeran dikir. Bi tenê ferqa wan ew bû ku esker sêçar
carekî ji wan gelektir bûn.
Alî qêriya. Ev jî wek Serdêr bû, gava ku lê germ dibû
fendên xwe ên eskerî ji bîr dikirin û kurmancî lê dixist.
Reşo veciniqî û destê xwe avêt bêrîka tûrik. Bêtêl bi
Mencê re bû û Mencê jî di ber latê hema nêzîkî wî de bû.
Pênc-şeş gavan ji hev dûr bûn.
G3a xwe hejand û hilmekê ponijî:
”Ez wê bînim vir yan ez herim wir?” Dû re jî, ”lo heger
‘Cizîrê li ber avê jî here’ ez ê xwe bigihînêmê. ’Ya hero û
ya mero’”, got û wek kewekî pengizî pişt.

Serdar bi Mencê re dipeyivî. Wî bi lez bêtêl ji destê wê kişand:
”Alî bînbaşî ye!”
”Weh! Ma hûn hîn bi hev ne hisiyan e?”
Alî li ser rêya Îpekê Serdar di bêtêlê de zeft kiribû û bi xeberan raserî wî hatibû.
”Tu rast dibêjî?”
”Kuro dil ketiye wê Meyroya dêya te, bi telaq tiştek tê
247
ne hişt!...”
Alî ji bilî ku bi Reşo re carekê li geliyên Tinatê û carekê jî li derdora Qubala, çend carekî bi Serdêr re jî ketibû şer û dîsa xeber bi dêya Reşo re kiribûn.
Reşo sivik sivik peyivî:
”Yaho ma niha hewara heneka ye?”
”Kuro ji xwe niha tam wextê wê ye.”
”Ez di tor û bextê de Serdar!”
”Ê çi yanî?”
”Çawa çi! Bîst-sîh kesekî bişîne hewara min.”
Serdêr bi du sed û bîst-sîh çekdaran û sîlehên xwe ên herî giran ve, ji pişta Bezekê û heta ku digiha kaniyên Zivingê û jora Hatxê zeft kiribû. Bi yekê şevê re kozik û çeperên xwe xelas kiribûn û di kemînê de rûniştibûn. Ne Reyis, ne Reşo û ne jî komutanên herêman bi eva ku wî kiribû dizanîbûn.
”Çima?” got û beşişî.
Mirî li erdê ba jî gava ku kenê wî dihat dikeniya.
Reşo xwe aciz kir:

”Ne wextê kene!”
”Cihê min xweş e birako.”
”Ez xulamê te me bi a min bike.”
Serdêr hîn ji serî de pê dizanîbû ku gava biqewimiya,
heta reş ne ketiba erdê tu kesî wê cihê xwe bernedaba. Cih
ne cihê revê bû; yek xelas ne dibû. Di çiyayên asê de şer
ne dikirin ku bi vir de û wir de birevyana. Têra xwe hebû,
guhên wî dilebitî.
”Ma qey te teql û çelqa şeran ji bîrakiriye?”
Serdêr, bi hatina eskerên di ser rêya Petrolê re fêhm
kiribû ku wê şer têketa aliyê Reşo û di çiva Hemko re neh-
248
deh tîmên xwe bi ser Qûzo de rê kiribûn û hîn jî bi rê dikirin.
Her tîmekî wî ji pênc kesan pêk dihat.
”Bijî Ebûkatê Jinan!”
Serdar hîn bêhtir keniya:
”Em ê li xwe bikin şev, erê yan na?”
Di vê navê re jî Mencê her ji kêlîkekê fîşekek berdida
û bi bayê fîşekê re milê xwe li sênga Reşo dida.
Piştî ku Reşo jê re got ”qûndaxa keleşkofê hişk bigire”,
bi Serdêr re peyivî:
”Erê.”
Kêfa Menca Xerzî hatibûyê. Reşo him li xwe vegeriyabû
û him jî li ba bû. Temamê eskerên dewletê bi ser wan
de biqêriya, dîsa jî ne xema wê bû. Çefî ji ser porê filfilî
herikîbû mexzena qirikê. Biskên wê ên tarî û xelek xelekî
mîna dahfan xwe bi ser eniya mêkewî, ruyê gewr û boz de
berdabûn û di ber bayê şer re ha ha direqisîn. Xwe di bombeyan

de rapêçabû. Bê çi li qamê dixwarin. Memikên wê
ên hinarî, di hêwana bejin û bala bilind de bi dengê keleşkofê
re bêsekin diricifîn.
Reşo bêtêl pekand dera han. Ji xiramê pêşber sê eskeran
hevdu diparast û bêserî bi vir de û wir de diçûn. Li
yekî ji wan xist. Ên din pê ve rabûn. Li wan jî xist. Wî
nedîta bernedidayê, gava berdidayê jî lê dixist. Gulê wî fût
ne diçû. Ji jêra wî du bombeyên destan li ser hev teqiyan.
Cefilî!
”Mencê em û eskeran ketine nav hev”, got û serê xwe
hema rakir.
Guleyekî çimê ber bêvilê firand. Dilopên xwînê bi lez
hatin xwarê. Gêj bû. Bi dev û ruyê xwe girt û di cih de
rûnişt. Çend pîjik di hinarkên ruyê wî de çikilî bûn. Xwîn
249
li Mencê vemirî. Bêhemd keleşkof ji destan herikî. Xwe
ne girt. Serê wî xist himbêza xwe û xwe lê pêça. Reşoyê
ku bêvila wî di coka memikan re hilm distend, ”Mencê!”
got û hawêrdor nerî.
Şer li jêr û jora wî tevdigeriya. Bahoz û Sîpan bi tîmên
xwe ve li wan fitilîbûn; derbasî neqebên newala Melê
bûbûn û berê refek esker ber bi hewdê Bûkan û pahnavên
Kumberê de vekiribûn. Pahnavan di çavên eskeran de
cihekî stratejîk xuya kiribû, lê hatibûn xapandin. Pahnav
bêstar bûn û hemû jî ketibûn ber devê bikisiya tîmê ku
çend çabox erd ji Reşo dûr sekinîbû. Tîm bêûjdan lêxistibû.
Li jor jî tîmên ku Serdêr şandibûn, xwe gihandibûn
şewlên duryana Qûzo û ji wir zor dabûn eskeran. Û Reşo

jî bi sîh-çil hevalên xwe ve di sênga şer de sekinîbû. Alî bînbaşî ya divabû paş de vekişiya û yan jî divabû sêng biqelaşta. Sêngqelaştin zêdeyî qeweta wî bû. Reşo yek ji wan jî sax bernedida. Lê gava paş de vekişiya jî Serdêr wê lê girêbida. Xwe xistibû çemberê ya jî ew xistibûn çemberê. Çekdaran bi nehberkê pê re lîstibûn û çeqûber lê çêkiribûn. Li vî alî û li wî alî cendek digindirandin.
Reşo piştî ku ji tîmê jora xwe re got ”fîşekan zêde bernedin” û bi bêtêlê bi Bahoz re peyivî:
”Ketî ?”
”Na.”
”Çûyî?”
”Na.”
”Winda?”
”Na.”
Piştî ku ”eferim!” got, dîsa dewam kir:
”Cihê we?”
250
”Asê ye”
”Pêxwas?”
”Em raserin.”
”Fîşekan zêde bernedin û zorê nedin wan!”
”Temam.”
”Cihê xwe bernedin!”
”Temam.”
”Li min negerin, ez ê li we bigerim!”
”Temam.”
”Li pêxwasan guhdar neke, bêtêlê bigire!”

”Temam”
”Bi wan re nepiyivin jî!”
”Temam.”
Di vê navê re Mencê jî bêsekin li sê komandoyên ku
ber bi wan de qedimîbûn girêdabû. Komandoyan jî mîna
ku Reşo nas kiribûn wek baranê gule bi ser wan de dibarandin.
”Alî min bike!”
Reşo deng ne bir xwe. Bi Xaçoyê midyadî re ketibû
têkiliyê:
”Ketî?”
”Dudu, lê yek jê giran e.”
”Çûyî?”
”Yek.”
”Kî ye?”
”Soro.”
”Cihê we?”
”Asê ye”
”Pêxwas?”
”Em raser in”
251
”Fîşekan zêde bernedin û zorê nedin wan!”
”Temam.”
Ditirsiya ku Alî bînbaşî mîna di geliyên Tinatê de dîsa
garankî biajota ser. Him eskerê wî pir bû û him jî li gora
wî qîmetê esker li ba tune bû. Û bi ser de jî di şerê guher,
tahtbeş û qelaçan de taktîkan xêr ne dikir; piraniyê qezenc
dikir. Lê Reşo nizanîbû ku Alî ev yek hîn ji serî de kiribû:
Bi belavkirina mijê re ji bin polê xwe ê rastê gule xwaribû

û piştî seetekê jî miribû. Du yuzbaşiyan şer îdare dikirin.
”Soro ha!” got û keserek kişand. Dû re jî bi wahc eniya
xwe firkand.
Mencê dîsa destê wî hejand:
”Ez lê naxim, tu karî lêxî! Bi ser me de tên!” got û
bombe ji ber xwe kirin.
Cih bi hev guhertin.
Reşo bêpêjin li ber nîşanê veteqilî. Milê yekî bi qasî
gilokeke hevîr jê xuya kir. Berdayê. Bi barîniya xwe re
bilind bû! Wî dîsa li ser kir. Li textikê eniyê xist.
Dirêjî bêtêlê bû:
”Ebûkat!”
”Bijî lawê Meyremxanê!”
”Çima?”
”Du seeteke ku deng ji Alî nayê; te kuşt.”
Dev ji wî berda û bi lez li Şevger geriya.
Cîgirê Şevger:
”Şevger çû, ez Masî bêje heval-pismam!”
Reşo piştî ku ji kûraya kezebê axînek kişand:
”Masî, heger tu rast bêjî ez ê te efû bikim”, got û bêtêl
da ber guhê Mencê.
252
Demoyê pismamê wî nexweşê ku bi bêtêlê li eskeran
guhdarî bikira; bistira, xeber bida û bi wan re têketa devjengê.
Ji bêr wê yekê jî ji komutaniya mifrezê bûbû. Dîsa
rojekê di şer de ew û komutanekî digirin hev. Komutan ji
aliyekî ve wî dipeyivîne û ji aliyekî ve jî çend eskerên xwe
dişîne ser. Bi kurtî, esker wî di pişt zinêr de zeft dikin û ew

jî xwe ji nav lepên wan xelas dike. Ji wê rojê de navê wî kiribûn Masî û bêtêl lê qedexe kiribûn. Bi qasî ku hûrikî bû ewqasî jî jêhatibû.
”Erê heval-pismam, ez bi eskeran re peyivîm. Û bi Alî re jî.”
”Kengî?”
”Ez dibê hema du seet çêbûn.”
”Baş e, ketî?
”Çar.”
”Çûyî?”
”Pênc.”
”Eeheew!” got û pala xwe da tahta pişt xwe.
Hewrên reş li ser çiyê diciviyan û peşkên xwe diavêtin qelaçan. Ro ji zû de winda bûbû. Taritî ketibû newalan lê li qada şer hîn jî piçekî ronayî bû.
Şerê ku bi haweyê kozik û çeperan û çarhawêr ji sê-çar kîlometreyan destpê kiribû, li ba Serdêr li hin cihan ketibû hikmê keleşkofê. Lê li ba Reşo esker û çekdar cih bi cih ketibûn nav hev û bi haweyê li daristanê û kuçên bajaran li hev xistibûn. Heta di guherekê de bombeyên destan jî di hev werkiribûn.
Tabûra Herbê qozê xwe ê dawî dilîst; li komikên Serdêr dixist û bi lez xwe vedikişand. Serdêr jî bi vekişandina wan re piştî ku bi Reşo re li hev kir, li bayê bezê paz-
253
deh-bîst tîmên xwe ên din bi ser de rê kirin. Di wê navê re jî eskeran bi haweyê ku fîşekên xwe biqedînin bêser û ber berdidan û pê bi pê vedikişiyan.

Reşo ji kêfan re dikir bifiriya. Him tu esker li van ên din zêde ne bûbûn û him jî hejmara çekdarên wî pir bûbûn. Pêşî bi lez û bez bi temamê serektîmên xwe û Serdêr re peyivî, qeweta xwe a mezin bi reşayê re bêdeng herikand başûrî xwe û çekdar di guher, bestik û beyaran de bi cih kirin. Dû re jî bi haweyê ku bala hêza pêşberî xwe bi aliyê xwe de bikişîne, bi ser kemînên xwe ên di başûr de reşand û revî revî cihê xwe berda. Esker bi reva wî degel bûn, lê bi dû jî ne ketin. Piştî ku bîst deqîqeyekî herdu alî jî xar bûn û li keft û lepta hev guhdarî kirin, vê carê jî çekdaran ji jor de bi qahr êrîş berdan û li vir û wir xwe dadan wan. Eskerên ku haziriya xwe û çûnê dikirin, şaşo maşî bûn û bêserî tevgeriyan. Dîsa qiyamet rabû! Xwe dadan hev. Şer sincirî. Çiqasî bi wir de çû, refên eskeran ji hev qetiyan, serberjêr bûn û serserkî li kemînên çekdaran qelibîn…

254

BEŞÊ SÊZDEHAN

1

Civatê li ba Heso rêz girtibû û Şivan neheq kiribû. Şivên jî ji wan daxwaribû. Piştî nîv seetekê jî bi hevalên xwe ve ode terikandibû û çûbûn mala Zibêr. Û ji wir jî bi dizîka bi bêtêlê bûyer ji Reyis re rave kiribû. Derew ne kiribûn. Wî çi û kê çi gotibû yek bi yek jê re dar ve kiribû. Li gora rêbaz û destûrên ku Reyis danîbûn ji bilî komutanên herêman divabû bi tu kesî re bêtêl tune ba. Lê ne komutanan û ne jî tu endamên partiyê zanîbûn ku Reyis bi navê ”Sîxur” hêzeke xefî damezirandiye û ji vê hêzê li ser serê her komutanê herêmê mirovek sekiniye; ev mirov bi

bêtêlê bi Reyis re di têkiliyê de ne û di derbarê wan û gundiyan de her tiştî dibêjin. Di nav sîxurên wî de yekî tebût jî tune bû. Ji bilî kesên ku xelkê ew wek tewtewan, cirnexweş û pêxwasan nas dikirin, kesên ku di êşkencexaneyan de teslîm bûbûn û hevalên xwe dabûn girtin û kuştin jî hebûn.

Serî li Heso geriyabû. Sal dîsa xerab ketibû û partiyê jî destê xwe xistibû qirika wî û doza dinyayek pere lê dikir. Sala ku çandinî nehata jî partiyê bi hesabê hatinê bi wî û Circîs re dikir û pereyekî mezin ji wan distend. Çandiniya wan jî tev li nîskan, nok, ceh, genim, garis, şolik û kizinan hemû çar hezar olçek bû.

Beleyên dinyayê hemû bi ser de rijiyabûn. Li aliyekî ber digirt û li aliyê din jî ha ha diteqiya. Birêvebir qanih kiribûn ku ew û Circîs erdên xwe bi nêvî ji xwe û partiyê

255

re biçînin. Bi wî haweyî xwe ji bêşê xelas kiribûn. Lê vê carê jî çekdaran niyeta xwe li kuştina Fehîmê ku li ber pezê wî mezin bûbû, xerab kiribûn. Zibêr ji malbata wî bû, xwe dabû ber firotina sê sed-çar sed pezê pîberan, kesî pez ne kiribû û bi çekdaran re pez li newala Çêlkan kuştibûn. Dolmîşa ku kirîbû çekdar pê li nav gundên omeriyan geriyabûn; kiribûn tertoqek û avêtibûn dera han. Bihîstibû ku Reyis Reşo ji komutaniya herêmê bi dûr xistiye û Serdar jî nebedî bûye. Çekdaran hevt xortên hevdeh-hejdeh salî bi sebeba ku qeymeqamê Nisêbînê paswan dabûn wan û mast dibirin Qamişlê ji xwe re difirotin, girtibûn û anîbûn mala wî. Yek ji wan lawê dostê wî Bihemedê Araqfiroş bû.

Nas dikir. Bavê wî jî salek berê kuştibûn. Li ber wan geriyabû, mîna pîrekan hêsir barandibûn, xwe avêtibû tor û bextê wan û gotibû:
”Ma ev ên kuştinê ne malviritîno! Hemû hîn zarok in. Di ruyê wan de ne xayintî, feqîrî û belengazî xuya dike. Dema ku ez di emrê van de bûm, ji nîhandina keran bigirin û heta ku digiha diziya mirîşkan min her tiştê xerab dikir. Ez tolaz bûm; fesad û fisek bûm. Ma ez çi û ne çi bûm! Ji bo merhebayekê min malê xwe hemû di devê çawîş, hakim û makiman de radikir. Ez bênamûs û bêşeref bûm; lê îro jî vaye hûn min dibînin bê ez yekî çawa me. Lawo ez xulamê we bim van naşîkan nekujin, hîn tehma şîr ji devê wan tê!”
Lê heyf, gotinê hîç fêde ne kiribû. Serokê çekdaran jî piştî ku jê re bi dizîka gotibû ”Apê Heso, emir ji jor de hatiye; heger em wan nekujin heval wê me bikujin”, herhevt ji gund derxistibûn û di navbera Zorava û Cibiltînê de bi dîrekên telefonê ve daliqandibûn. Termên wan hîn wilo
256
bi dîrekan ve, xebera kuştina dostê xwe ê ezîz Cewzoyê Bûblanî bihîstibû. Cewzo hevalbendê berzaniyan bû û çekdaran ew bi sebeba ku esrar firotibû polîsan di hindurê mala wî de kuştibûn.
Seyra neviya wî wek seriyekî penêr bû. Û çekdaran jî mîna temamê xort û keçên ku beşdarî nav partiyê dibûn, ji bo perwerdekirinê ew rêyî newala Nesarayê kiribûn. Çavreşî avêtibûn biraziyê wî Hemo. Hindik mabû serê xwe çelq bikira. Ev hemû ne bes bûn tew Sarê jî rabûbû ser

tapanan; gotin bi çekdaran re dikir û bi ser de jî zorî dabûyê ku mîna salên berê dîsa şerekî bi wan re li dar bixîne. Ji aliyekî ve yextyarî û ji aliyekî ve jî kul û derd û merezên dinyayê ew ji derb xistibû. Dilê kafiran bi halê wî dişewitî! Nema dizanîbû bê wê çi bikira. Ketibû rewşeke heyirî. Bi vir de diçû li çalê, bi wir de diçû li bîrê diqelibî. ”Li çepê min dûpişk û zîhayên maran û li rastê min jî gur û wawîk veketîne.” Şivan çûbû Gavan hatibû şûna wî. Alî bînbaşî hatibû kuştin Nîhat bînbaşî xwe berdabû meydanê. Zibêr û Miho cih bi hev guhertibûn. Û bi ser de jî navê wî dîsa kiribûn Proleter Mihê. Xwîn bi xwe ve dîtibû, ”xwezî bi kefendiz!” gotibû û çend rojekî xwe ji gund dabû alî. Lê piştî ku Kenêr Circîs qanih dike û bi mebesta barkirinê seriyekî li Diyarbekirê dixînin, Heso nehişî li gund vedigere û xwe diavêje tor û bextê Circîs da ji gund bar neke. Circîs dîsa bi a wî kiribû. Van herdu mirovên ku ji kurmanciya kevin de û heta destpêka tarîxa telebeyan, berberiya herî bi qirêj bi hev re dikirin û gelek mêr ji hev kuştibûn, di van salên dawî de bûbûn mîna du birayên ji dê û bavekî. Bêyî hevdu tu tişt ne dikirin. Bi hev re ji tas û sêniyekê dixwar û vedixwarin. Serê yekî ji wan biêşiya ê din

257

ji ber serê wî ranedibû. Herduyan jî exlaq û karekterê hev qebûl kiribû. Circîs Heso mirovekî zarxweş, siyasetgerekî têgihiştî û kone û Heso jî destbirakê xwe mirovekî bi gir û xwedîsoz didît. Ji ber hindê di civatan de Circîs her tim peyv dida dest wî û wî çi bigota wî jî disediqand. Ji her kesî bêhtir kêfa Sarê bi wê hevaltiya wan a ji dil û can

hatibû û xwe ciwan his kiribû.
Circîs ji nezewicandina keç û xortan serê xwe li dîwaran dixist û digot ”vî Reyiskî xelkê me xesand!” Li gora wî ew yeka han tiştekî pir kilêt û talûke bû! Him rê li qehbitiyê vedikir û him jî bizirê wan ji dinyayê diqeland. Li Zorava û temamê herêmê ji bilî jinên bî, gelek keç di mala bavên xwe de pîr bûbûn. Û hin xortên ku bazdabûn Tirkiyê û Ewrupayê li wir jî ne wêrîbûn bizewiciyana. Reyis di vî warî de pir dijwar bû! Pir li ser disekinî. Keça Selîm û lawê Bedrên hevdu ravandibûn Trabzonê û ji teref sîxurên wî ve hatibûn kuştin. Partî li kuştina wan xwedî derketibû. Birêvebiran bi haweyê ku du zinêkarên mezin ceze kiribûn, di nav xelkê de ha ha propaganda wan dikirin. Lê Heso jî bêdeng ne mabû û gotibû:
”Lawik jî û keçik jî ji me ye; em ên hev in. Em qu.. ê hevdu biçirînin, bidirînin, em çi bikin ji hev a wan çî ye? Namûs be, bênamûsî be çi be ji me re ye. Ma partî ahliwuqûfê qu... û kî...ê me ye qey? Waweylê, tu ji xwe re li me û vê partîkê, kuro!”
Keça Remo bi dû eskerekî ketibû. Li Stilîlê çend keç bi tîman re zewicîbûn û reviyabûn Tirkiyê. Li hin kolanên bajaran qehbitî heşkere dibû. Bi kurtî, di vê guherê de gelek tiştên ku bi kultura wan ne diket, dibûn.
Heso û Circîs û hevalbendên wan, serwextî Reyis û
258
partiya wî bûbûn. Ji her tiştê wan fêhm kiribûn û dizanîbûn bê dawiya wan bi xwe wê li ku derê bisekiniya.
Gotina serxwebûn û azadiya kurd û Kurdistanê di destê

Reyis de wek arduyê tenûrê dîtibûn. Reyis û partiya wî bi wan gotinan xelk li dora xwe civandibûn û tenûr dada bûn. Li herêmê û heta belkî li temamê welêt propaganda herî mezin û bidestxistina dost û hogiran bi şer dibû. Mîna ku Kenêr digot, ”van kûçikbavên tirkan tu rê ji miletê me re ne hiştine ku ev milet şer neke...” Belkî jî ji ber wê yekê bû ku di demekê de heta bi ên wek Kenêr û Erol Efendî jî bûbûn dilxwazên Reyis.

Heso jî mîna hevalên xwe û maqûlên herêmê, rêya xelaskirinê di pîberiyê de didîtin. Lê li xwe danetanîn ku bi karekî wilo rabûna. Li aliyekî tam bawerî pê anîbûn ku armanca birêvebirên partiyê têkbirina doza wan e û li aliyekî jî bi heriştê xwe ve ketibûn xizmeta partiyê. Ne dev jê berdidan, ne malên xwe bar dikirin û ne jî li hev diciviyan û bi tena serê xwe li himberî çekdaran disekinîn. Bi rastî Heso hewl dabû xwe ku bi hin maqûlên herêmê re yekitiyekê pêk bînin û bi wan re şer bikin. Lê Kenêr ew sekinandibû. Li gora Kenêr şerê îro bi her haweyê xwe ne dişibiya şerê deh-duwazdeh sal berê. Şerekî kurdistanî li dar ketibû; di vî şerî de ne bi tenê telebe û xortan, pîrek û zilaman jî cihê xwe girtibûn. Partî di nav xelkê de pir bi hêz bûbû û bi ser de jî ji hin dewletan alîkarî distend. Lê di eslê xwe de a ku Heso çavtirsandî kiribû, liberxwedana Serhanê omerî, Xelîlê torî û Evdoyê sîtî bû.

Serhan piştî ku du lawên xwe û temamê malê xwe di rêya partiyê de feda dike, xwe ji partiyê vedikişîne û li cihê xwe rûdine. Lê çekdar wê yeka han danaqurtînin; bi

ro digirin ser malê û bi lêdanê wî ji vî eyarî derdixînin dixin eyarekî din. Serhan direve Nisêbînê. Li vir jî ji destê wan lêdanê dixwe. Xwe diavêje Diyarbekirê. Dîsa wî rehet bernadin. Diçe Batmanê. Îcar di nîvê sûkê de piştî ku du parsuyên wî dişikînin, polîpoşman li gund vedigere û bêhis û pis li mala xwe rûdine. Lê çend rojek nakeve wê navê, çekdar dîsa digirin ser malê. Bi qasî ku jina wî digot, çekdar bi lêdanê dev ji mêrê wê bernadin heta ku ajantiyê li ser xwe qebûl dike. Dû re jî wî dibin teyara binya gund nav koma kermêtiyan. Pêşî ji gundiyan re teybê vedikin û hema pê re jî cercûrekî keleşkofê di gewdeyê wî de vala dikin. Gava ku li odeya Heso gundî li ber teybê gihabûn hevdu, dêya Serhên xwe avêtibû ser lawê xwe û dengê keleşkofê di ber dengê hewar hewarên wê re diliklikand, Sarê jî teyb li erdê xistibû û xeberên herî pîs bi Reyis û partiya wî re kiribûn.

Lê Xelîlê ku ji her kesî bêhtir alîkarî ji wî re lazim bû, bi haweyekî din li ber xwe dabû. Dîsa milyonek pere jê xwestibûn. Ma wê çawa bida? Ne li Ewrupayê kar dikir û ne jî mîna mala Xatê xwediyê bajarê Mêrdînê bû. Mêrik torî bû û şikarteke erdê wî ê çandiniyê jî tune bû. Sala ku terizê li rez ne xistiba deh-pazdeh bar mewîj jê re dihatin. Qûtê wî hemû ew bû. Lê têra çi dikir? Kuflet nanê ceh û garisî dixwar û şekalên zarokan jî çarox bûn. Xelîl di ber pereyan de xwe dabû ber pênc bar mewîj. Lê ew ji ser a xwe ne hatibûn xwarê. Di dawiyê de piştî ku wî didin ber hev û mîna hejîrê dinermijînin, hevteyekê mohnetê didênê. Nikare pereyan peyde bike, îcar radihêje tivingê û

di mala xwe de li ber wan asê dibe. Lê çi fêde, liberxwedana wî a ku seet ji nehê sibehê dest pê kiribû, li dehê rojê
260
bi kuştina wî, jina wî û sê zarokên wî ên tifalkî qediyabû. Xirbekê wî bi saroxan hilweşandibûn. Dihat gotin ku çêleka wî jî di êxur de şewitîbû.
Evdo ne wek herduyan jî kiribû.
Berî derbeya eskerî bi kerê xwe li hidûd dixist û qaçaxiyeke bi qasî barê kerê ji xwe re dikir. Ne maldar û ne jî ewqasî feqîr bû. Xwe didebirand.
Çekdar wek tîmên êşkencexaneyê pê re dipeyivin û sê milyonan jê dixwazin. ”Baş e” dibêje. Li kerê xwe ê şamî siwar tê; seet li dor duwazdehê nîvro berê xwe dide nav kulmoza eskeran û li hindama Çûva li hidûd dixîne. Esker jî hema di cih de lê girêdidin û wî û kerê bi ser hev de digevizînin.
Çekdarên ku li ser tiştên herî piçûk jî car carê gundî dikuştin, hinavên Heso hilqetandibûn. Ji ber malê xwe dabû kerembera, ketibû tolaqa canê malbatê û hevalbendên xwe. Jina Miho Fehîmê wî ê bahlûlekî xapandibû û jê re gotibû ku li çiyê mirov dizewicînin. Fehîm gihabû çekdaran û piştî sê rojan jî bazdabû. Çekdar ha ha lê digeriyan û Heso jî ew di kadînê de vedişart.
Navê Erol Efendî bi ajantiyê derxistibûn û lê şidandibûn ku mala xwe bar bike nav tirkan. Carekê jî bi mebesta ku çûbû Swêdê ba lawê xwe û bi ser de jî li wir araq vexwaribû bi çar milyonan ceze kiribûn.
Nav wan û Sadiq bi carekê ve xerab bûbû. Sêdiq bi

zimanê xwe nikarîbû; li dijî wan bi vir de û wir de gotin diteriqandin. Wan jî ajantî pê ve zeliqandibûn û her tim dikarîbûn ji xafil de derbek lê xistibana.
Mela Salar di dilê xwe de tam bûbû dijminê wan. Û heta ji doza kurdî jî sar bûbû. Bêdeng li mala xwe rûnişti-
261
bû, bêşa xwe dida û têkilî karê wan ne dibû. Lêbelê li gora Heso, ava serê wî bi agirê qirşikan germ dikirin. Reyis di kasetê de bi sebeba ku keça xwe ji Sînên re rêyî Swêdê kiribû, geft lê xwaribûn û erza wî şikenandibû. Mela bi qiyametek pere ceze kiribûn û sê rojan jî ew di şikefta jora berqefên gund de hepis kiribûn; lê dîsa jî tê ne bihurîbûn. Şikefta ku wek ”hepsa gund” hatibû bi nav kirin, tije rêx û pîsî bû. Zivistanên wê ne dihatin kişandin. Li gelek gundan hepsên partiyê hebûn. Li gundê ku şikeft heba şikeft, tune ba jî xirbeyek wek hepsê bi kar dianîn. Lê digel ku her derê Gurik bi şikeft bûn jî, çalên Axkortê kiribûn heps. Heso Hûto bi dîn û îmana xwe ne dida! Hûto şerefa partiyê şikenandibû; Zibêr mezinê wê bû û wî jî ew di nav lepên xwe de guvaştibû û mîna gokekê firandibû hewşê. ”Em nikarin vê tirê ji vî dehbeyî re bihêlin” Gavên gotibû û li Hûto şidandibû.
Xelef bi haweyekî din bû: Li ber wan herimîbû. Lê bi kêrî çi dihat, piştî ku xwe bêerz kiribû û her tiştê xwe jî bi dest wan ve berdabû, mêr bûbû. Ne bêşa xwe dida, ne erdê xwe daman dikir, ne bi temamî û ne jî bi nêvî dida wan. Bi ser de jî ew bêminet kiribûn.
Mîrzoyê Mitirb jin û zarok di stuyê Heso de hiştibûn û

xwe ji gund dabû alî. Luqmên li pêşberî çekdaran bi tizbiya
xwe lîstibû; Hesûk lingekî xwe ramidandibû û herduyan
jî heryek milyonek pere ceze xwaribûn. Sêdiq di civatê
de qerfeke bûblanî kiribû; erza wî şikenandibûn û du
rojan jî ew li ser alifê kerê girêdabûn. Jina Miho û Kerîm
li ser dora tenûrê pevçinîbûn. Serokê, jina Kerîm bi nanpêjandina
çar tenûr nan ceze kiribû. Kerîm bi xwe ne xweş
anîbû. Serokê jî ew yeka han wek bê emriyekê li himberî
262
partiyê dîtibû û çil û pênc rojan nanê tenûrê lê qedexe kiribû.
Kenêrê ku dikarîbû kose û berkoseyên herî mezin jî
bixapandana ji ceze û qedexeyan xelas ne bûbû. Bi ser de
jî navê wî xistibûn nav lîsteya xayinên herî mezin.
Lawê wî Restem li Swêdê dima. Hevalekî wî ê sêwêdî
bi milama ku Hepsa Darê bibîne alîkarî jê xwestibû. Wî jî
edresa gundê xwe dabûyê. Erîkê arkeolog bi texsiya xwe
piştî ku xwe gihandibû Mersînê, di nîvê sûkê de bi
berîberdaniya trafîkê ji desthilanîn ketibû, texsî sekinandibû
û xwe jê avêtibû. Lê wê revê jî ew xelas ne kiribû.
Terempêlekê lê xistibû û ji mirinê rabûbû. Bi kurtî, çekdaran
jî Erîk ajanekî emperyalîstan dîtibûn û beleyên emperyalîzmê
anîbûn ber deriyê Kenêr.
2
Gavên vê carê jî bi sebeba ku gundî eskeran nehewînin
gund, temamê zilaman li odeya Heso civandin û wî û
Heso mîna du ribatan dîsa girt hev. Mirov digot qey beleyên
dinyayê hemû ji bo van omerî, torî û bûblaniyan hebû.
Yekî bi pênc qurûşan bi ser wan venedibû. Yek ji yekî

xerabtir bû. Partiyê mirovê herî bêqîmet, barûte û tewtewe li ku ba, ew dianîn û li ser serê wan dikirin mezin.
Zibêr gotina Heso birî:
”Hevalê Gavan, Xelef, Circîs û Selîm jî ne hatibûn hewarê.”
”Şoran neke! Tu jî çûbû, lê ma tu hatî kuştin?”
Kurikiyan esker ne hewandibûn gund. Komutanê tûgaya Mêrdînê jî bi qeweteke mezin kişiyabû ser Kurka
263
Çeto; deh-duwazdeh kes kuştibûn, gund şewitandibû û vê carê jî girtibûn ser Qurdîsê. Çekdaran jî bi mebesta ku hin gundî xwe bigihînin Qurdîsê, piçûk-mezin bi hezaran kes ji hindama Çûva heta bi Qesra, li ser rêya Îpekê civandin. Şensê wan hebû ku Heso di nav wan de bû û di vê gavê de jî yuzbaşiyê merkeza Nisêbînê Hesen, esker îdare dikirin. Li gora Heso, yuzbaşî camêrekî di ser xwe re bû. Berpirsyarê komê û Hesen Yuzbaşî li ber hev dan.
Berpirsyar:
”Em ji vir ranabin heta ku walî neyê vir…”
Hesen tibabê sê-çar seetan bi wî û hemiyan re peyivî. Di dawiyê de xist serê wan ku tu carî wê walî ne bê ber lingên wan û ne jî bi telefonê bi wan re bipeyive.
Berpirsyar:
”Baş e, naxwe çend kesan ji me bibe Qurdîsê bê we esker ji ser gund rakiriye yan na?..”
Hesen, çar kes ji wan li docê siwar kirin û bi rê ketin. Lê ”Yuzbaşiyê Girarê” li hêla Qesra ew sekinandin û destûra çûnê nada. Hesen dîsa li ber wan geriya û telaqê

xwe avêt ku esker ji ser Qurdîsê rabûne.
Berpirsyarê komê vê carê jî wilo got:
”Ji bo ku em dengê xwe bigihînin Ewrupayê, em ê heta seet yekê şevê li vir bimînin.”
Hesen:
”Terempêlên temamê dinyayê li ser vê rêyê ne; dewlet ji we qebûl nake hûn bi seetan vê rêya mezin û bi çûn û hatin bigirin. Hûn ê hemû bên kuştin, rabin!”
Berpirsyar:
”Em jî ji xwe li vê digerin.”
Di dawiyê de Heso xwe ne girt û berê xwe da xelkê:
264
”Gelî hevalan, ma ne em bi sebeba ku me ê esker ji ser Qurdîsê rakiriba em li vir civiyabûn, lo. Ê me esker rakir, ê îcar em çima ranabin yabo qurbano, weh!” got û da ser rêya gundê xwe.
Gundiyan jî da dû. Lêbelê partiyê jî piştî çendeyekî bi sebeba ku Heso xwepêşandan ji hev belav kiribû, bi şeş milyonan ceze kir.
Gavan piştî ku erza Zibêr şikenand dîsa mezin peyivî:
”Me çiyayên Kurdistanê ji eskeran bi carekê ve temîzlemîş kirin. Çiya ozgur bûn; niha jî dor hatiye ser gundan.
Bi dû gundan de jî em ê bajaran ozgur bikin.”
”Lêbelê tabûra Herbê û qereqola Stilîlê hîn li cihê xwe ne.”
Gavan mîna ku li bendî gotineke wilo bû, yekser bersiv da:
”Rast e heval Heso. Reyis taktîkan li wan dike, gerek

hûn wergê zanibin. Ew li ber me hîç in.”
Ronahî di çavên Heso de ne mabû. Ji wan hatibû bêvilê;
li ber devê xwe ne dinerî û dipeyivî:
”Na, ez dibêjim wan taktîk li we kiriye ku çiya bi dest
we ve berdane.”
Gavan reş û şîn bû. Rabû ser kaban û devê xwe dagirt.
Lê Kenêr di dev de hişt:
”Eskerên tirko temamê taktîkên dinyayê bizanibin jî, li
himberî taktîkên Reyis nabin tiştek! Helbet ew bi tiştekî
dizane ku ev çend eskerk li derdorên me hiştine”, got û wî
jî mîna her kesî çixareya xwe pêxist.
Ji herdu çekdarên ku li tenişta hev rûniştibûn û li ruyê
hev ne dinerîn, yekî dengê xwe bi ser ê hemiyan xist:
”Hevalino, bes vê çixareyê bikişînin. We çavên me ji
265
dixanê kor kirin, yaho!”
Kenêr:
”Ezbenî li me negirin, kişandina çixareyê tebîhetekî
me kurmanca ye. Li vê herêmê zilamê ku çixareyê nekişîne
wek zilam qebûl nabe.”
Zibêrê ku li qehwexaneyê qehwe û li mala xwe jî çayê
vedixwar, gotina wî birî û dengê xwe hilda:
”Temo, qehweyekê ji me û van mêhvanên me ên ezîz
re li êgir bike.”
Heso piştî ku awirek tê veda û devê xwe vekir, Miho di
ber de hişt:
”Ji bo miletê xwe divê em xwe ji ber tiştekî nedin alî;
ji gotina partiya xwe dernekevin û çi tiştê ku ji destê me

bê em li hindama wê texsîr nekin.”
Heso xwe ne girt, berê xwe dayê û destê xwe hejand:
”Tu ji xwe re li me û van hakim û sawcîkan binerin,
kuro! De îcar safî bikin! Erê bavê mino, ev tu û Zibêr hûn
ji min re nabêjin bê we kîjan mektebe xwendiye ku vê partiyê
hûn kirine hakim û sawciyê siqî yonetîma vê herêmê
û xelkê li ber destê we mehkeme dike, hi? Dibê de were û
kirasê xwe neçirîne! Zaroyên bavan pazdeh-bîst salan
qûna xwe diçirînin heta ku dibin gidiklî başçawîş û ên me
jî bêyî ku gû û rêxê ji hev nas bikin bûne hakim û sawciyên
me!”
Gavan reşxeriqî, destê xwe li erdê xist û bi qîje wîj got:
”Tu kî yî ku tu vê heqareta mezin li partiya gelê kurd
dikî! Ma tu ji partiyê bêhtir bi exlaq, edalet û jîr û zanahiya
hevalê Zibêr û Miho dizanî?”
Circîs bi ken xwe di nav wan rakir. Piştî ku got, ”bavo
de ka bihêlin ez jî çend gotinan bibêjim”, Gavan sekinî û
266
wî dest pê kir:
”Berî her tiştî divê mirov bide û bistîne û li hev guhdarî
bike. Helbet partî bi gelek tiştan dizane. Lê ezbenî, divê
partî bi vê jî baş bizanibe ku gava hema eskerekî qereqola
Stilîlê bişîne dû me û em nerin, wê eva me wek serhildanekê
bibînin û bi kolordiyan êrîşî ser me bikin. Em bi
çend keleşkofk û tivingkên xwe nikarin bi eskeran re derxin
serî. Dewlet xwedî tenq û top û teyare ye. Yekî ji me
sax bernadin. Kurikî û qurdîsiyan bi a we kirin û esker ne
hewandin gundê xwe. Eskeran jî kerrê wan li guhê wan

sekinand; him kuştin û him jî gundên wan şewitandin."
Mirov digot qey Gavên tiştên ku wê di vê civatê de
bigotana, hîn ji serî de ezber kiribûn. Ji xwe emîn bû. Bi
mijarê ve girêdayî ne girêdayî, kê çi bigota ji bo wî qet
xem ne dikir. Bêyî ku li ser bifikiriya û bersiva wan bida,
a xwe digot û derbas dibû.
"Hevalê Circîs, a mihîm ne kuştin, liberxwedan e. Li
hersê perçeyên Kurdistanê li dor sed milyonî kurd yaşamîş
dibin. Dema ku ji vî sed milyonî pêncî milyon bê
kuştin, wî çaxî jî Kurdistan qurtarmîş dibe. Ji bo qurtarmîşkirina
welatê xwe gereke em ji kuştinê netirsin."
Heso dizanîbû ku wê Circîs peyva herî ne xweş pê re
bikira. Keserek veda. Dû re jî bi hêdîka kuxuya. "Allahumessabirîn,
xwedêyo tu çêkî", got û dewam kir:
"Heval Gavan rast dibêje. Di miletê me de zilam şer
dikin. Îcar ji sed milyonî gava pêncî milyon zilam bên
kuştin, ên mayî pîrek dimînin û tirk jî wî çaxî wê ji xwe re
di hemiy...nin. Kurdistan 'qurtarmîş' dibe û weselam!"
Gavên bi lez destê xwe dirêjî kêleka xwe kir. Sêdiq jî
bi dizî destê xwe danî ser demaçeya xwe. "Heso te zima-
267
nê xwe pir uzatmîş kir!" got û bêhnçikyayî ji hindur derket.
Berê xwe da mala Miho û bi bazdan çû.
Ava vî Gavanî û Heso qet di cokekê re ne diherikî. Her
tim radibûn hev. Bi rastî sîrek bê çi bû, di Gavanê rihayî
de ne diçû. Ji îsotên deşta Heranê jî tûjtir bû. Bi ser de jî
xew lê çûbû. Yekcar ji hev de ketibû. Li çiyê kar û barê
xwe dimeşand. Lê ji ber tebihetê wî, Reyis ew ji çiyê

daxistibû gundan. Tiştekî zêde zêde ji agirê biharê hez dikir. Dema ku biharê serê xwe hildida û dar dipişkivîn, wî dest bişewitandina dar û beran dikir û bi bêhna wan re serxweş diket. Şevekê eskeran ew û mifrezeya wî li ber êgir zeft kiribûn û li wan reşandibûn. Bi tenê ew û yekî din sax filitîbûn.

Bi rabûna wî re civat tevgeriya. Hin tirsiyan û mîna teyrikan xwe bi erdê ve melisandin. Û hin jî bi haweyê ku xwe di her çendên rûniştî de bifirînin rabûn ser xwe û li Heso û Circîs nerîn. Heger di vê bêhnikê de van herdu kalan li xwe biqewimandana û çekdar bêminet kiribana, rewşa wan bi carekê ve dikarîbû bihata guhertin. Heso dengê xwe kir, lê bi haweyekî din:

”Ev niha hûn nayên em bazarekê bi hev re bikin? Hûn dewlet û em jî milet, em ê herin hilbijarê û li gora piraniya rayan bi hev re bikin.”

Gavanê ku li hêla Torê jî navê xwe kiribû Bagok, ji devê derî bi dengekî hêl:

”Na, em nakin! Partî çi bêje ew e”, got û yekser li cihê xwe ê berê rûnişt.

Ma dikirin qey. Baş pê dizanîbûn ku zoravî ne dişibiyan cibiltîniyan. Li Zorava Heso û Circîsek hebû û zoravî bi terbiya wan mezin bûbûn. Çekdarên ku cibiltînî bi devê

268

tivingê li ser bênderan vehewandibûn, hiştibûn ku rayên xwe heşkere bi kar bînin û dû re jî hemiyan ji gund bazdabûn, wê zû bi zû nikarîbana ev yeka han li Zorava bikrana.

Heso li Gavên nerî û dest bi şîretan kir:

”Lawê min, ev çima em wilo li ba we bêqîmet in? Ma ji bo ku hema sif hûn me pîs bikin, we ev şer li dar xistiye? Li zarokan binerin û tiştekî ji aqilê xwe fêhm bikin. Heta bi zarokan jî, her kes bi êşa xwe dizane û wê nas dike. Ew zarokên ku bi hatina we re direqisîn û li çepikan dixistin, ji ber we îro xwe di axuran de vedişêrin. Ma hûn cendirme ne? Na. Hûn zarokên me ne. Pîrekên me bi sebeba ku me ji dil û can xwe ne dabû pişt we, bi me re pevdiçûn. Lê îro bi me re pevdiçin ku çima em we ji gundê xwe naqewirînin. Di dan û stendina we û wan de ev yeka han xuya nake gelo? Belê. Ma hûn siwariyên osmaniyan in ku ev pîrek naxwazin çav li we bikevin? Na. Hûn rêberê miletê me ne qaşo. Ka hûn ê ronahiya azadiyê bana, lê hûn bûne xezeba azadiyê! Em ji tirsan pereyan didin we. Ev tiştekî pir eyb e! Xwedê bi milyaran insan xuliqandine. Û yek jî naşibe yekî. Lê we em hemû şibandine hev û bi devekî hûn bi me hemiyan re dipeyivin. Lixwekirina me û we bûye yek.Wilo nekin. Mêrkujekî ku li serê çiyan ha ha digere, helbet wê nikaribe araqê vexwe. Lê yekî li bajêr çima wê venexwe? Mehkûmekî dewletê dibe ku nikaribe bizewice, lê yekî gundî û bajarî wê bizewice, çavên min. Hûn...”

Gavên gotina wî birî û dîsa tiştekî beredayî got:

”Yaho heval Heso, ji bo ku esker neyên gund gereke hûn her tim şiyar bin.”

269

Heso jî bi xwe dizanîbû ku ji tahtê re dibêje. Mêrik li sikakên Rihayê mezin bûbû. Ma diket serê wî, yan jî jê

fêhm dikir? Kurd kî ne, ji ku hatine, urf û adetên wan çawa ne? ji kitêban jî hîn ne bûbû. Lê dîsa jî vî Hesoyî nikarîbû bi xwe. Dilê wî bi ser wan ve bû. Hema çawa bana jî zarokên kurdan bûn û eskeran ew jî dikuştin. Gotinên mezinan mîna kevirên kelehan bûn, belkî yekê cihê xwe bigirta. Wilo difikirî. Li gora wî partî ordiyek bû. Û sererkan jî ordî bi rê ve dibir. Ji çekdaran xwîn vedirşiya, lê a wî ne ji dijminahiyekê filan bû. Hevalên wî hemû jî wilo bûn. Ma Kenêr hindikî ji wan re gotibû? Heger ne ji şîretên wî bana, belkî navê wî jî mîna ê Erol Efendî bi ajantî dernexistibana.

Heso hêrs bû:

”Kuro heval, wilehî û bilehî, ji wê roja ku qereqola Stilîlê çêbûye û heta roja îro, qet xew bi çavên me ne ketiye, yaho!”

Gavên mîna tîmê êşkencexaneyê xwe kil kir û wilo jî peyivî:

”Hûn nikarin bê emriya partiyê bikin û eskeran têxin gundê xwe! De ka rabin ser xwe ku em hemû bi hev re li dora gund qenalan bikolin” û rabû ser xwe.

Tirs dudilî bû. Carina mirov mêr dikir û carina jî mirov ji desthilanîn dixist. Di van bîstikan de tirsê Heso kiribû agirê semewatan.

”Partî xurifî ye”, got û tepek li nav serê xwe xist.

Gavan rabû ser kaban:

”Heqaretê neke!”

Circîs:

”Niha tu ka pêşî rûne.”

Rûnişt.
”Esker ji xwe nayên gund. Bi tenê ew jî roja ku hin ji we tên girtin û di me hildidin, digirin ser gund û dînê me teneke dikin!”
Piştî şerê guhera Mexelan ne bi gelekî, eskeran piraniya gundên herêmê bi dest çekdaran ve berdabûn û di bajaran de civiyabûn. Car carê digirtin ser hin gundan, girtin û kuştina ku ji wan re lazim bû dikirin û zû vedikişiyan. Li hin çiyan jî biryargehên wan hebûn lê ewqasî têkilî çekdaran ne dibûn.
”Wer xuyaye ku du kes li vî gundî li qarşî partiyê ne û gundiyan ’aliştirmîşî’ muxbirî, bêşerefî û bênamûsiyê dikin. Di girtina ser gundê Dala de jî dîsa van herdu kesan gundî ’caymîş’ kiribûn”, Gavên got û dîsa ode terikand. Partiyê emir dabû ku piçûk-mezin temamê bûblaniyan bigirin ser şeş-hevt malên pîberên dalayiyan.
Heso û Circîs wek her tim dîsa li himberî biryara partiyê derketin. Lê di dawiyê de Circîs li mala xwe ma û Heso jî ji bêgavî da pêşiya komê û bi nîvrokî re avêtin ser Dala. Birêvebirên partiyê piştî ku li derdorên gund alên partiyê çikilandin û berê gundiyan dan malên pîberan, Heso jî hêrs bû û got:
”Lawo terî ji we kêm e! Ma hûn vê garana eskeran nabînin bê çawa dora me zeft kirine. Dev ji vî aqilê xwe ê beredayî berdin. Me hawêrdorên gund bi beyreqên Kurdistana xwe xemiland; me xeber bi wan re kir û ew jî ji ber me reviyan. Eyb e ji me û bavê me re ku em herin malên

wan talan bikin û li zarok marokên wan xînin. Û a din,
gava ku em êrîşê bibin ber deriyê xelkê jî, ev esker wê me
bikujin, weh! Îcar bavikên mino, me a xwe kir û ji me re
271
serifî; de ka em vegerin gundikên xwe...”
Hesoyê ku ‘ketibû neqeba Xelîl û Celîl’, li aliyê din jî
ji Hesen yuzbaşî re digot:
”Hesen beg, xwe neke wek me, em hemû jî xurifî ne.
Me bê xwîn beyreqka xwe çikiland, tu jî bê xwîn here rake
û bi rêka xwe de here.”
Gundiyan bi a birêvebiran ne kirin û dîsa dan dû Heso.
Lê partiyê jî ew yeka han ji Heso re ne hişt û ew dîsa bi
pereyekî mezin ceze kir.
Gavên serê Heso pir sincirandibû. Wî hîn ji hindur
gava xwe ne avêtibû der, Heso dengê xwe rakir û got:
”Ev Gavan li xezebê digere. Ji xwe re lê binerin kuro,
ma dibe ku gavan û şivan bibin mezinên insanan, yaho!
Bila ji xwe re herin ber heywên, weh! Erê kuro, mehek
berê bû dîsa vî Gavankî ji me re got ku vê carê jî hûn ê di
hewşên xwe de sixinaqan bikolin. Me jî kola û taht derket.
Wî got asîtê bi kar bînin. Erê lo, em di hepsa Diyarbekirê
de ne”, got û hîn bêhtir dengê xwe rakir:
”Waweyzê, tu li me û vê partîkê! Gundikê me bi carekê
ve li ser tahtê ava bûye; tonek asît têra me nake, yaho!”
272
BEŞÊ ÇARDEHAN
1
Di êvareke nîsana sala 1992an de, gurceke xezalan bi

meşa qitikê li guhera Mexelan çû û hat û li vir û wir temaşe kir; ne kesek dît û ne jî pêjna tu kesî kir. Xwe da ber latekî bilind û buxçika xerzanî ber bi xwe de kişand. Bi lez cil ji xwe kirin. Û bi lez jî kirasê bûkaniyê bi ser devdelingê kurmancî de li xwe kir. Piştî ku bi hêrs herdu şekalên xwe pekandin dera han û qundera kabikî bi serê tilîkên lingan ve kir, rahişt kemberê û li ser newqa zirav girêda. Dest avêt guhar û berbiskan. Pişt re jî gokên zêran, xirxal û bazinan. Bêhnekê li hepiriya xwe a soringî nerî; xwe berda ser kaban û di nav destên xwe de li hev qulipand. Deverûk jî mîna hepiriyê, xerzanî girêda. Şûşeyekî lewentoyê ji bêrîka kirês derxist. Bi ser xwe da kir. Lê qet pêwîst ne dikir. Xwêhdana wê mîna gulavê bêhn difûrand. Bi wê bejina şitilrihanî tena tena li dora xwe zîvirî û li memikên xwe ên xav ku di bejin û bala bilind de mîna du hinaran bel bûbûn, temaşe kir. Dû re jî bi bayê felekê re beşişî, pê li pişkoka teybê kir, dengê wê heta bi niqra dawî hilda û xwe bi ser devê xeşîmeyê de tewand:

”De were bûk li bendî te ye!”

”Ma tu din î? li der ve nabe!”

Xwe ji dil aciz kir:

”Bi ahd û wahd be ku ne li vê derê be, min ne hişt tu bibî zave! Em ê li vir bikin da Reyis me bibîne bê em çi dikin ji prensîp, exlaq û terbiya wî!...”

Evîndarê wê ê ku di xeşîmeyê de xwe bi zavetî girêda-

273

bû, gotina wê ne kir dudu; mîna pêhlewanan xwe çeng kir ber; kete milê wê û li ber deng û ribaba Mîrzoyê Mitirb

hevdu girtin. Herdu jî di çax û benga xortaniya xwe de bûn
û herduyan jî hîn ji delava jînê venexwaribûn. Ji hev hez
kiribûn, bi hevt dilan dil ketibûn hev û di rûnê evînê de
qiçqiçî bûn. Ji dilê wan mîna cobaran xwîn herikîbû.
Bûbûn hêsîrên xeyalê û di nav agirê dojehê de li hev geriyabûn.
Bi hesreta dîtina van kêlîkan her tişt bêminet kiribûn;
di qorzîbirên herî tarî re derbas bûbûn û xwe gihandibûn
vê guhera eşqê.
Geh bi milan, geh ji sêngê dan ber hev û qederê nîv
seetekê hevdu birin û anîn. Dû re jî bûkê destê xwe dirêjî
keleşkofê kir.
”Na na!...”
Wê guh neda wî. Berê keleşkofê da binya xetê û cercûrê
xwe yekser vala kir. Pişt re jî lîland; di nav gîha û
kulîlkên biharê de rûnişt û got.
”Min şilfîtazî bike da ji wir min bibîne. Ma ne ji me re
dibêje ku ez ji vir we hemiyan dibînim bê hûn çi dikin...”
Evîndarê wê nemerdî ne kir. Li ber çîmên wê ên sedefî
çong berdan erdê; bi hemd deverûk hilda û ziq li çavên
wê nerî. Tîr direşandin. Çavên wê ên mêrkujî û ew awirên
wê ên ku mîna derbên şûr û riman dijwar bûn, di borana
eşqê de ji desthilanîn ketibûn. Vê siltana ku di diruvê
pilingan de sahw dida, mîna xezalekê henûn bûbû. Bi biskên
ku li ser ruyê wê dahf vedabûn lîst û hepirî ji serî kir.
Porekî di rengê şevê de da der; ruyê wê wek lempeyekê
pêket û li derdora xwe şewq veda. Eniya wê a weke pengê
maçî kir. Ew kete ber pêlên evînê. Wî bi herdu sêvan girt
û tevdan. Wê xwe ne girt; şehweta ku bi dengê devzira-

van, top û metilyozan pê re bûbû qeşa, xwe berda û lêvên xwe ên terhikî bi ên wî re kirin yek. Bi yek tûşê re bexçeyê paxilan da ber pozê wî; cotê memikan xiste sêngê û kûra tarîxa keçkaniya xwe bi carekê ve di pesara dilê wî de vekir. Dil bi dil keribî, xwe dadan hev û hawêrdor şîp û lehiyê da der. Di çar-pênc saniyan de xwe şilfîtazî kirin û bi bayê zemên re hevdu guvaşt û alastin û bi gezan êrîşî hev kirin. Lêvên herduyan jî çiriyan. Reşo nehişî lûleyên wê ên mermerî bi ber xwe de kişandin û bi dev û pê û lepan kete himbêza wê. Tibabekî hevdu gevizandin. Sêng û berên Menca Xerzî di nav şînahî û gul û beybûnên biharê de mîna stêran ji xwe re û me re diçirisandin. Serê tilîkên xwe ên ku ji şimayê jî nermtir bûn, di çermê pişta wî de çikilandibûn û ha ha digot:

”Xwe lêxîne û lêxîne heta ku tu qanûn û manûnên wî tar û mar bikî! Pişt re jî em ê li ser lingan bikin da baş me bibîne bê em çi xweliyê li serê xwe û wî dikin!...”

Her cihê ku pê digirt û dilivand, di bin tiliyên wî de dixiliyan. Ji her der wê şehwet diherikî. Laşê wê di nav destên wî de bi qasî dilopeke avê bê qewet bûbû. Kelaxê herduyan jî mîna hêtûnê sincirîbûn.

”Mencê, şer û pevçûn û kîn û dexs û jîn hemû bi hev re ji te dibarin. Keçê te ez serxweş kirim!”

”Ez ê te mîna beyendûreke zêrînî her tim di hêwana dilê xwe de veşêrim. Heta ku ji te bê xwe li vê prensîpa wî xîne! Bidirîne, biçirîne, bêmirês bike, bike, bike!...”

Piştî ku bi ava lêvên xwe ên narincî kela dilê xwe sar

kir, vê carê jî keleşkof da dest:
”Berê wê ber bi newala Nesarayê de veke û tam cercûrekî vala bike!...”
275
Wî ne xwest, lê wê ew mecbûr kir. Ma karîbû bêdiliya wê şaha çiya û zozanên Kurdistanê kiribaya, qey? Du cercûr vala kirin!
Reyisê ku pir zêde li ser zewacê disekinî, bi vê mebestê gelek çekdarên xwe kuştibûn. Li gora Reşo, heger ne ji wî haweyê wî ba, zewac jî bi çekdaran belkî ewqasî şêrîn nebûya. Bi rastî carina hin çekdarên ku pazdeh-bîst salan ji hev mezintir dibûn jî dil diketin hev û gava keys lê dianîn jî bi hev re radiketin. Daxwaza wan a şehwetî, sewiya kultur û têgihiştina di navbera mêr û jinê de xistibû. Jineke herî xweşik û zana dikarîbû aşiqî qamqutekî kirizî û cahil, yan jî mêrekî herî zana, sipehî û bejintîtalî dikarîbû aşiqî xerabeyeke bi her haweyî bûbaya. Qîmetê sipehîbûnê û ferqa di navbera mêr û jinê de ne mabû. A wan bûbû wek mesela ”ji kevir nermtir” çi heba.
Bûyera Mizgînê tesîreke mezin li ser Mencê kiribû. Li çiyê şûşeyekî parfumê pê re hatibû girtin. Reyis jî ew xwestibû ba xwe, li wir mehkeme kiribû û di dawiyê de kuştibû. Li gora wê, Mizgînê parfum ne ji bo dilpijokiyekê peyde kiribû. Li bajaran mezin bûbû û hînî neserşûştinê û laşê genî ne bûbû. Û bi ser de jî gelek asaq tê kiribûn, tiştên ne li rê pê dabûn gotin û nav şeqên wê kêr kiribûn.
”Heta ku em serê xwe li himberî Reyis hilnedin, wê tiştekî kurdî ji vî şerê me fêhm nebe û em ê hemû jî wek

kûçikan bên kuştin”, Mencê got û belkî cara pêncî bû ku dîsa xwe li Reşo rapêça.
Reşo jî piştî ku keserek veda û axînek kişand, qulipî ser sêngê, devê xwe da ber ê wê û mîna birîndaran di devê wê de peyivî:
”Birîna me bi qasî ku fireh bûye ewqasî jî kûr çûye,
276
delala min. Heta doh jî, bi tenê tiştekî ku me ê bikarîba bikira hebû, ew jî rev bû. Îro ew jî nema bi dest me dikeve. Li çiyê û gundan heval digerin û li bajaran jî esker û polîs. Bi tena serê xwe em ê çawa li dijî vî cenewarê ku me bi destê xwe afirandiye bisekinin? Siyaset çewtiyan qebûl nake. Gava ku te kir tu ê jî bikişînî. Me hemiyan siyaset ji mirovekî re berda. Me li ser serê xwe imperetorek çêkiriye.”
Imperetora şerê guhera Mexelan dengê xwe lê rakir:
”Lê dema mirov ê pevçûnê be, mirov imperetorê herî mezin jî dikare ji hev belawela bike. Tu çima vê nabêjî?” got û li qûn rûnişt.
”Rast e. Lê bi kê? Ji min û te û Serdar pê ve ka kî heye gelo?”
Bi haweyê ku Reyis di nav lepên wê de bû, lepên xwe bi ser hev de guvaştin û bi qîje wîj got:
”Em dikarin wî bikujin, em dikarin wî bikujin!...”
Wê çiqasî bi deng û bi hêrs digot, Reşo jî ewqasî bêdeng û nerm digot:
”Ew jî rast e. Lê bi kuştina wî partî wê nekeve destê me. Him em ê bên kuştin û him jî wê Elo here û Celo bê

şûna wî. Ma ne wilo ye?”
Mencê hêrstir bû. Tiliya xwe anî ber çavên wî û dengê xwe hilda:
”Divê rêyeke xelasiyê ji vê pîsîtiya me re hebe! Vî cenewarî em ji rengê insên derxistine. Zilma ku em xwe bi xwe li hev dikin ne bes e, îcar tew em li xelkê xwe jî dikin! Ma Serdar ê girtinêbû? Ma Baran ê kuştinê bû? Ma mirov ji bo awirekê keç û lawan dikuje? Ma mirov jin û mêrên ku tên nav şer ji hev berdide? Pîber dibin, kafir dibin çi
277
dibin bila bibin, mirov zarok û heywanên wan nakuje! Lê em dikujin. Heqê me û dîtin û gotin û pêşniyaran tuneye. Em li vir şer dikin û ew ji wir emir li me dike. Xeberan ji me re dide. Di nav me de solalêsî aniye heta bi kabê. Yek ji me li ser êdin kiriye ajan û me bi hev dide kuştin. Em bêşexsiyet bûne! Xîret û hesyet bi me re ne maye!...”
Reşo bi destê wê girt û ew himbêz kir:
”Bêhna xwe fireh bike eşqa min a serî û dawî. Mêrê dema ku jineke wek te jîr û zana û mêrxas li pişt sekinîbe, ma ditewe?”
”Kuro bêhna çi, tiştek di me de nema em qediyan! Cûdî ji bo ku di xewa xwe de gotibû ‘Reyisê min ne wek te ye’ mehkeme dibe û tê kuştin û tu jî hîn dikare behsa bêhnfirehiyê ji min re bikî! Çi jin, çi mêr, çi insan, çi heywan qîmetê tiştekî li cem vî wehşî ne maye! Har bûye, har!”
”Heger kar hemû ne di destên wî de ba, ew ê jî ewqasî har neba.”

”Me hemiyan serserî û dînikî dibîne.”
”Ê herî serserî û dînikî ew bi xwe ye. Heger ku...”
Mencê devê xwe anî ber guhê wî û bi dizî got:
”Ez dixwazim lawek ji me re çêbibe. Min di şikeftekê
de veşêrê û heta ku ez lêwik bînim li min xwedî derkeve.
Û dû re jî, bi wê sûnda herî mezin ez ê herim Reyis bikujim...”
Reyis, piştî şerê guhera Mexelan bi rojekê, bi sebeba
ku Serdêr herêma xwe bêyî wî terk kiribû û hatibû hewara
Reşo, ji komutaniyê avêtibû û li dor neh mehekî ew
hepis kiribû. Mencê ew yeka han bi xwe ne xweş anîbû û
Reyis bi wê nexweşiya xwe hisandibû. Reyis jî Mencê ji
278
terfî û rutbe kiribû û şandibû hêla Rihayê. Li derdora Sêwregê
piştî ku hevalekî wê bi birîndarî wê xelas dike û di
çar mehekî de bi ser xwe ve tê, Reyis wê û çekdarê ku wê
xelas dike dikişîne ba xwe û wan mehkeme dike. Ji mifrezeya
ku tê de cih girtibû herdû sax filitîbûn. Mehkeme
tiştekî ji wan naqefîne. Reyis vê carê jî wê di nîsana 1990î
de dişîne herêma Botanê ba Reşo. Di wê navê re jî di nav
komutanan de bi dizî eşqa wê û Reşo dihat gerandin. Lê
hay û bayê herduyan jî ji wê yeka han tune bû.
Heyva nîsanê di guhera Mexelan de xwe bi ser herdu
evîndaran de meyl dabû û her der di nava ronahiyê de
hiştibû. Ezmanê ku sedef girêdabû, navserên çiyê dialast.
Stêr yek bi yek ber bi hev de kişiyabûn û komik bi komik
li rajorên wan civiyabûn. Mirov digot qey sirûştê bi destên
xwe daweta wan li dar xistibû; ji binê her tahtê, kevir û
zixurekî hawe bi hawe dengek dihat. Ji her qul û qelîştekê

bêhna misk û emberê difûriya. Dar û devî û kulîlkên biharê bûbûn xêlî, xwe li wan rapêçabûn û bêwestan bi bayê evîna wan re direqisîn.
”Dilê min, ez ê navê lawê xwe jî bikim Reşoyê Sarê”, Mencê got û axênek kişand.
Her maçeke wê mîna penselînekê xwe bi nav canê Reşo de berdabû. Devê xwe ji boxaza qirika wê dernedixist û dipeyivî.
Lerizî:
”Tu bi mêrxasiya xwe pilingeke li çiyayê Mava û bi spehîbûna xwe jî çîçekek hov e li çola Sehrayê. Ez çi me li ber te, ez nagihêm toza te, eşqa min! Bila navê lawê te Reşoyê Mencê be.”
Wê xwe hîn bêhtir lê pêça û ew bi ser xwe de guvaşt:
279
”Lo lo kuruko, ê ne tu nizanî bê min ji destê van çiyan û newalên ku em ji hev dûr kiribûn, çiqasî kişand! Bi sura bayê sibehê re ez ê hilkişiyama ser serê kaş û girên deşta Heranê û min ê berê xwe bida Omeriya, Xerza û Botanê da bêhna te bikim; li newalên herî kûr, li best û bestikên herî xewlecih radiketim da tu ji xewna min dernekevî. Evîndarî kuleke çiqasî mezin e! Ez”, got û ji nişkê ve gotin bire dereke din:
”Reşo, ji ber ku tu heraqê pevçûnê yî, tu pir bi aqile jî. Lê ruhê min, tu çima serê xwe li ser ku mirov bi sûîkastekê Reyis ji holê ranakî naêşînî? Bi kuştina wî re berê tarîxa şerê me dikare bê guhertin...”
Digel ku Reşo serwextî her tiştî bûbû, dîsa jî kuştina

Reyis tu carî ne niqutîbû dilê wî. Bawerî pê anîbû ku di wextekî nêzîk de, Reyis wê nema karibe ji bin giraniya bûyeran derkeve, xwe ji seroketiyê vekişîne û partiyê teslîmî birêvebirên wek wî bike. Lê di eslê xwe de ji bo wî a herî girîng ku aminî bi hevalên xwe ne dianî. Li ser ku Reyis ji meqamê wî bike fikirîbû. Lê ji bin derneketibû û dev ji wê fikarê berdabû.

”Ax şêrîna min, ez piraniya wextê xwe li ser ku hevalên min baweriya xwe bi min bînin derbas dikim. Me hemiyan jî hevîr di zikê hev de stiraye.

Doh bi dizî dibû, lê îro heşkere jî mirov nikare Reyis bikuje. Vê meselê ji bîr bike.”

Mencê ew ji ser xwe heliqand:

”Tu derewan dikî! Lê tu jî ji bîr neke ku tu ê bi vî aqilê xwe winda bikî”, got û xwe pevxist.

280

BEŞÊ PAZDEHAN

1

Salan li herêma Xerza, Botan, Torê û Omeriya roj û şev xistibûn ber bahoza zemên û bi vir û wir de şeg û peg dikirin. Salên ku di wextekî de xwe reş girêdabûn dîsa li Hesoyê bûblanî vegeriyabûn. Bîr û bawerî, rêz û hirmet hîç ne mabû. Camêriyê koça xwe bi carekê ve bar kiribû. Kesek bi kesî nema amin dibû. Her kes bi xwe lebikîbû û ketibû tolaqa canê xwe. Her kes her tim li ser tiştekî herî piçûk jî dikarîbû bihata kuştin. Her tiştî mîna gotinên Kenêr encam dabû. Ji aliyekî ve eskeran û ji aliyekî ve jî çekdaran li xelkê herêmê, temamê rêxistinên aştîxwaz û ronakbîran

şidandibûn, bi haweyekî pir dijwar bi ser wan de
çûbûn û hemû jî di xwînê de fetisandibûn. Xelkê herêmê
jî mal û milkên xwe ji wan re berdabûn û bi nav tirkan û
dinyayê de terqiyabûn. Ji bilî çend gundên ku li Torê û
Omeriya cih dabûn eskeran û pîberî qebûl kiribûn, gund
ne mabûn. Tev de hatibûn şewitandin. Li gora Heso barkirina
pêşî ji ber zilma çekdaran ji gundê Xerêb dest pê
bûbû.
Sofî Hedanê xerêbanî bêşa xwe ne dabû. Çekdaran jî
piştî ku navê wî kiribûn ”Sofîajan” û jê re gotibûn ”tu ne
kurd î, here nav tirkan”, dest danîbûn ser rez û alav malavên
wî û ji gund berdabûnê. Sofî bi kufletê xwe ve çûbû
gundê Qesra. Çekdaran qesirî zewr dabûn. Sofî çûbû
Nisêbînê. Li vir jî eman ne dabûnê. Di dawiyê de Sofî revî
revî xwe avêtibû Stenbolê û bi haweyekî şop ji ser xwe
winda kiribû.
281
Çekdaran Fehîmê Şivan di mala Heso de zeft kiribûn.
Heso xwe avêtibû tor û bextê wan û dest û lingên wan
maçî kiribû, lê dîsa jî fêde ne kiribû. Fehîm bi xwe re biribûn
Bizgûrê, dengê wî jî xistibûn teybê, mehkeme kiribûn
û li pêş çavên gundiyan kuştibûn. Dû re jî, mîna ku ew
hemû ji bo Heso ne bes bûn, bi ser de jî kaseta bûyera
kuştina wî jê re anîbûn. Piştî vê bûyerê, Circîs li ser ku
çima nabin pîberên dewletê, xwe bezandibû Heso û çi
hatibû ber devê wî jê re gotibû. Lê Heso jî pir li ber geriyabû
û ew ji vê fikra wî jî vegerandibû.
Bi ser kuştina şivankê wî de hîn du meh ne bihurîbûn,

vê carê jî çekdaran bi şev avêtibûn ser mala Erol Efendî û di hindur de li wî û jina wî reşandibûn. Erol di cih de miribû û jina wî jî xwe li miritî danîbû. Di vê bûyerê de partî jî bêdeng ne mabû. Kuştina wî bi tîmên dewletê ve girêdabû. Tîman xwe wek çekdaran girêdidan û li vir û wir gundî û bajarî dikuştin. Lê jina Erol Gavan nas kiribû. Piştî ku Reyis dengê jinikê bihîstibû, hema pê re Gavan dide girtin û komek çekdarên xwe dişîne Zorava. Digel ku Kenêr li ser mehkemekirina Gavên pir sekinîbû jî, çekdar ji wê yekê reviyabûn, erza wî şikenandibûn û Gavan li pêş gundiyan mehkeme ne kiribûn. Ligora Kenêr hema hema destê temamê komutanan ketibû xwîna xelkê û Gavan jî yek ji wan ê ku sûcê wî herî hindik bû. Çekdaran Gavan li ser bênderên binya gund girêdabûn û bi zoraviyan ew dabûn ber keviran. Zoraviyan cendekê wî du şev û du rojan ji erdê ranekiribû. Li nav mezelê xwe jî veneşartibûn. Li gora ku Kenêr digot, bi mehkemekirina Gavên xwestibû ku sûc gihandibaya komutanê herêma Xerza û

282

Mêrdînê jî. Dabû nava wî û ji wan xwîn verşiyabû. Komutanê herêma Xerza qesda kuştina Birehîmê hildehî kiribû û bi wê mebestê çekdarekî xwe şandibû Batmanê mala wî. Birehîm dostê Kenêr bû. Bi kurtî, çekdar ji qedir û marîfet û welatperweriya wî têr ne bûbû; sê-çar rojan li mala wî mabû û pişt re jî rast vegeriyabû cihê xwe. Komutên çekdarê xwe îfade kiribû:

”Gerek te ew kuştiba. Ew bêşeref di wextekî de endamê PKGKê bû.”

”Îcar çi yanî, ma qey sûc e? Ez jî di wextekî de endamê ÎGDê bûm.”
”Lê dîsa jî gerek tu destvala venegeriya, te hema yekî din bikuşta. Te ji bîra kiriye ku partiya me bi xwînrijandinê geş û xurt dibe”, gotibû û demaça xwe di serê wî de vala kiribû.
Komutanê herêma Mêrdînê jî ne kêmî ê Xerza bû. Li gora gundiyan, menderî ji partiyê sar bûbûn û Mistoyê ku ji birayekî wî pê ve tu kesî wî tune bû jî li Menderê xwedî çend sed olçek erd bû. Komutên gazî Misto kiribû û ew bi êvarkî re li pişta Zorava tev li texsiya wî bi saxî şewitandibû. Birayê wî jî piştî şewitandina birayê xwe, serçelqî bûbû; li ba eskeran cih girtibû û ketûber dest bi kuştinê kiribû. Lê gelek ne ketibû wê navê ew jî hatibû kuştin. Dîsa vî komutanî ji Deqoyê hatxî re gotibû, ”tu bi hin pîrekan re radikevî.”
Wî jî gotibû, ”gava ku dilê min wan dixwaze, ez diçim kerxaneyê” û ji bal komutên ve hatibû kuştin.
Reyis Sadiq û Hemo xwestibûn ba xwe û herdu jî mehkeme kiribûn. Mehkemeyê Sadiq ”ajan” ilan kiribû û li ser hev du ”idam” dabûnê. Idameke wî bi sebeba ku di wex-
283
tekî de lawê xwe li ser êlif girêdabû û a din jî li ser ku keça wî a çekdar bi eskeran re derketibû çiyê. Lê Hemo idameke tenê xwaribû. Ew jî li ser ku Ezîza keça xwe kuştibû.
Li gora Menca Xerzî, di roja ku Sadiq û Hemo gihabûn Nasarayê mehkeme bûbûn û herdu jî di heman rojê de hatibûn kuştin. Partiyê piştî kuştina Masiyê ku li Nasarayê

li ser Sêdiq û Hemo bi demaçeyê êrîşî Reyis kiribû û ji alî parêzgerên wî ve hatibû kuştin, bûyera kuştina Sêdiq û Hemo nekiribû dengî. Û heta Reyis bi xwe jî pir li ser çekdarên Nasarayê sekinîbû ku bi taybetî Reşo li bûyerê hayî neba. Jê dipelikand. Reşo di nav xelkê û temamê çekdaran de mirovekî jîr û zana û qehreman hatibû qebûl kirin. Di her şerê ku kiribû ji bal xelkê û çekdaran ve, navek bi dest xistibû. Jê re digotin ”qertelê guhera Mexelan, bazê çiyayê Bagokê û pilingê çiyayê Cûdî!” Lê Mencê Reşo serwext kiribû. Reşo ji Reyis hatibû bêvilê, lê dengê xwe jî ne kiribû û bûyer bi xwe re hilanî bû.

Piştî ku kuştina Erol Efendî li Gavên rast bûbû, dilê zoraviyan ji partiyê sar bûbû û çavreşî avêtibûn Zibêr û Miho. Circîs xwe berizandibû wan, zirt li partiyê kirinibû û gotibû:

”Heger partî van herdu bêşerefan nekuje, em ê jî bibin pîber û dijminahiya herî mezin bi partiyê re bikin!”

Partiyê jî bi dû zirtên wî de hema bi çend hevteyekî, Zibêr bi sebeba ku bi lawê xwe ê li Swêdê re bi telefonê peyivîbû, pezê pîberan bi saxî kuştibû, du sed milyon pere nebedî kiribûn, dijminahî xistibû gund û gundî ji partiyê sar kiribûn, li mizgefta gund mehkeme kiribû û kuştina wî bi dest Circîs ve berdabû. Lê Circîs qebûl ne kiribû. Çekdaran bi xwe kuştibû. Pîra jina wî jî bi dû kuştina wî de bi

284

çend rojekî bi şev hatibû kuştin. Lê kuştina wê jî fetîs ne çûbû. Lo gora gundiyan, çekdaran bi pîrê ”vedabûn.” Pîrê bi kuştina Zibêr re gelek gotinên ku li hesabê partiyê ne

dihatin, teriqandibûn. Lêbelê partiyê Miho bi kufletê wî ve ji gund rakiribû û berê wan dabû Elemanyayê; li bajarê Hanoferê bi cih kiribûn û di demeke kurt de jî Miho kiribû serdozgerê dadgeha xwe a li temamê Ewrupayê. Digel ku partiyê hin meqsedên Circîs bi cih anîbûn, çavên Circîs dîsa jî nema ne bi partiyê û ne jî bi Zorava bar bûbû. Bi Mîrzoyê Mitirb re li Nisêbînê li mala biraziyekî xwe bi cih bûbû û mîna derwêşan xwe ji gelek tiştên dinyayê bêrî kiribû. Car carê Sarê jî xwe gihandibûyê û bi şev û rojan li ba mabû. Herdu jî baş pîr bûbûn. Lê ne bi qasî Hesoyê ku xwe dida ser gopêl û vaca vaca dimeşiya. Xwîn û elema zemên di navtarên Zorava de dabû ber hev. Ew Zorava ku bi dengê qerf û henekên Heso, Sêdiq û dengbêjiya Mîrzoyê Mitirb dihejiya, dîsa ketibû temara mirinê û çarhawêr kundan lê xwendin. Mirov digot qey ew gundê şênî vala bûye. Tirsê xwe rapelikandibû her derê. Xof û sawê her der rapêçabû. Her dereke gund mîna goristanê xuya dikir. Heta bi kûçikan jî bi tisr direyan. Bi şevê ji bixêrîkan êdî dixan nema diçû. Her kes di hindurê xwe de li reşê rûdinişt. Şevbihêrk rabûbûn. Ji her derê vî gundê vemirî bêhna mirinê difûriya...

Kenêrê barbihêr di hundurê xwe de xeşîmeyek kolabû û bi şev tê de radiza. Carina jî bi roj. Kêm kêm derdiket nava gund. Ji tirsa ku çekdar û tîm wî di hindurê malê de zeft nekin, şazdeh kûçikên har peyde kiribûn û li derdora xaniyê xwe girêdabûn. Kenêr hema hema bi carekê ve ji qewet ketibû. Di hindurê sê-çar salan de ji bilî ku her ji

çar-pênc mehekî tîman ew dibirin tûgaya Mêrdînê û li dor mehekê lê êşkence dikirin, du caran jî mehkemeyê ew twqîf kiribû. Li ser hev yazdeh mehan raketibû. Di êşkenceyê de bazinê lingê Kenêr ê rastê şikenandibûn. Dikuliya. Porê wî heta bi patika guhên wî weşiyabû. Hestî û çerm mabû. Te bi serê bêvilê girtibaya wê ruh jê çûbaya. Kufletê wî ji hev belav bûbû. Jina wî jî miribû. Bi tenê hew keçeke wî e bi dergîstî li ba mabû. Her ji çend mehekî lawê wî ê li Swêdê bêdeng çend qurûşek jê re rêyî Nisêbînê ba dostekî wî dikir û xwe bi wan pereyan li ser lingan dihişt.

Sarê jî çend carekî hatibû girtin, lê tewqîf ne bûbû. Ji girtina xwe bêhtir, li ber çend çekdarên ku her ji çend rojekî xwe berdidan gund û xwe dibezandênê diket. Partiyê navê wê jî bi ajantiyê derxistibû. Li nav sûka Diyarbekirê ji bo girtiyan xwe şewitandibû û ne miribû. Li gora wan divabû bimra. Reyis ew yeka han bi taktîkên ajantiyê ve girêdabû. Çekdaran bi vî rengî li dijî wê propaganda dikirin. Sûcê Sarê heta bi dev bû. Lê Sarê jî ji desthilanîn ne ketibû. Digel ku salan ew bi ser hev de pir guvaştibû, dîsa jî ji dar ne ketibû. Ji qerf û henekên wê eser ne mabû, lê hîn jî ew mêrxasa berê bû.

Heso bi haweyekî din bû: Wî jî mîna gelek maqûlên kurdan, simbêlên xwe qusandinibûn û di qula kerê rakiribû. Pişt re jî destên xwe bi carekê ve ji kar û barê dinyayê kişandibû û xwe dabû ber dîwaran. Germ ba, seqem ba karê wî mabû ku xwe bida ber dîwarê hewşa xwe, bi seetan li binya hidûd temaşe bikira û bi ser Sêdiq de bikaliya.

Pirsa wî heta ji teyrik û tilûran jî dikir. Ji Cibranê birayê wî bi tenê ew mabû. Û bi ser de jî li bavê xwe çûbû. Tema-
286
mê hilfa xwe berdabû ser. Delalîkê ber dilê wî û heta ê temamê malbata wî ew bû. Sêdiq Hûtoyê ku cendirmeyên qereqola Stilîlê ew li ber dewaran kuştibûn, pê dabû jibîrkirin. Bi serhildana Reşo re felekê serî li Heso û temamê malbata wî gerandibû. Çekdaran serê Kerîm pelixandibûn û bi ser de jî ne hiştibûn ku mela wî bişo, kefen bike û terqînê lê bixwîne. Bêvila Qaso jê kiribûn. Mîna tiştê ku bi serê Kerîm de anîbûn wilo jî bi serê Dasim de anîbûn. Seyrê li newala Nesarayê xwe kujtibû û Şewqedîn jî di nav çekdaran de li çiyê ji xafil de winda bûbû. Eskeran girtibûn ser gund. Xelîlê neviyê wî ê dînikî, ji ber wan reviyabû û li binya rez hatibû kuştin. Tisqa li Meyroyê ketibû; her roj dikarîbû bimra. Tîman Temo di bedêla Reşode rakiribûn Tûgaya Mêrdînê, Reşo xwe teslîm ne kiribû û bi êşkenceyê bavê wî kuştibûn. Hesoyê ku guhên wî giran bûbûn û bi zorê ber xwe didît, li yekê ji wan jî ne difikirî. Digel ku çekdaran ew û gundiyên wî ji malên wan derdixistin û hemû li ser bênderan dicivandin jî, dîsa dengê xwe ne dikir. Çekdaran Hesen Yuzbaşiyê ku wî jê hez kiribû, bi rêya Bizgûrê de kuştibûn û hema pê re jî dest danîbûn ser erdên wan ên ku bi serhildana Reşo re ne hiştibûn biajon. Erdê wî û Circîs bi mirêbayî dabûn çend kesên sarincî. Û Heso jî qet li ber ne ketibû. Ew kiribûn zilamê Hesen Yuzbaşî û ha ha jê re digotin ”Mixbirçî Heso” deng ne dibir xwe. Gundiyên wî ketibûn pêxêla hev

û ew jî têkilî nav wan ne dibû..
287
2
Bi banga sibehê re esker û tîman girtin ser Zorava û êrîşî mala Kenêr kirin. Bi dû ku li kûçikên wî girêdan û kûçik hemû kuştin, kişiyan hinduran û qederekî baş hindur saxtî kirin. Dû re komutên li pêpîkê xist; esker li dora xwe civandin û got:
”Li hinduran bireşînin!”
Çil-pêncî eskerî bi hev re li temamê hinduran reşandin. Xanî hilneweşiyan. Lê tiştekî ku bi kêrî deh qurûşan bihata jî di hinduran de ne mabû.
”Bombe bikin!”
Piştî ku bi bombeya hevtan re xaniyê malê jî li erdê sekinî, qêrîn bi Kenêr ket û kesî ji wan dengê wî ne kir, komutên:
”Bişewitînin!” got û wî bi destê xwe bîdonê benzînê bi vir de û wir de dakir.
Di vê navê re jî eskerên ku pênc-şeş tekerên terektoran ji hewşa Circîs anîbûn, di nav pûş û pelaxa mezelên xênî de rast dikirin.
Ro gihabû delavan û tîrêjên wê hîn jî stûnên dixana ku bi ezmanê Zorava de hilkişiyabûn, derbas ne kiribû. Stêra Kenêr ji nav stêran xericîbû û di newalên bê binî de rijiyabû. Ne pêjna çapiliya Reşoyê ku mîxfer li hewa difirandin, ne qîrên Circîs û Hesoyê ku di navtarên gund de bi ser eskeran de li hev vedigeriyan û ne jî bire bira dengê mêrxasiya Sarê dihat. Ma wê vî hejikî bi tena serê

xwe çi bikira? Bi ser de jî dûpişk bi pişta destê wî vedabû. Devê xwe ê ziwa xistibû birînê, jehr dimijt û diavêt. Heger xeşîmeya ku ji dîwarê êxur kolabû û çend gavekî dûr biri-
288
bû, mîna ê kafsenorî di hindur de kolaba, miheqeq ew ê jî bifetisiya.
Komutên dîsa li pêpîkê xist. Eskeran rêz girtin û wî got:
”Jin û zarokên Mîrzoyê Mitirb biavêjin der ve û xaniyê wî bişewitînin!”
Mala Mîrzo li rajorî Mala Kenêr bû. Eskeran bi hilm û pifekê re zarokên wî wek zebeşan bi vir de û wir de avêtin û benzîn û mazot li hinduran reşandin. Di wê navê re jî Melesa dev ji zarokan û her tiştî berdabû û li êxur bi ribaba ku Mîrzo bi dizî ji Rihayê kirîbû, daketibû. Eskeran agir bi hinduran danîbûn û wê hîn jî xwe ji êxur bernedabû. Heger ne ji lawê wê ê deh-duwazdeh salî ba, ji sedî sed ew ê jî bişewitiya.
Bi dengê pêpîka Haydar re, esker li cihê ku rêz girtibûn dîsa civiyan û ketin temenê.
”Ji bilî Heso Axa, zilam-pîrek her kesî li binya gund bicivînin!”
Bi gotina wî re eskeran mîna guran xwe dadan hinduran û heta bi nexweşên di nav livînan de jî ji malên wan derxistin. Xelef û Perîxanê herdu jî tawî û bawî bûn. Bi terşkên wan girtibûn û bi dû xwe de dikişkişandin. Xelef diqêriya, lê Sarê jî dabû ber Perîxanê û xeberên herî pîs bi wan re dikirin. Meyroyê bi pehînên tîman re xwîn avêtibû

û hema pê re jî miribû. Melesa ku ribab xelas ne kiribû, ji kerba nava xwe êzingek di eskerekî werkiribû. Eskeran jî kincên wê çilvirandibûn û bi lêdanê ew ji wî eyarî derxistibûn xistibûn eyarekî din. Sipîkê avtibû ser herdu çavên pîra Hesîna; hitim bûbû. Tîmekî jê re ”ez doktor im”, gotibû û tiliya xwe di çavê wê rakiribû. Çav pelqijandibû.

289

Bûka wê bi destê ê tîm girtibû ku çavê wê ê din jî nepelqijîne. Tîman jî li pêş temamê maliyan ew avêtibûn erdê û ketibûn ser zikê wê. Li dor nîv seetekê bazdabûn ser. Qire qir û care cara zarok û pîrekan ji her aliyê gund dihat. Mirov digot qey bûbû roja mahşerê û li vê mahşerê jî yekî bê guneh tune bû. Xwîn û girêz ji devê her kesî dihat. Her kesî bi devereke xwe girtibû û bi ser êşa canê xwe de dinaliya. Piştî ku Haydar temamê gundiyan li ser bênderan civandin û keça Kenêr jî teslîmî tîman kir, berê xwe da tara jor. Heso bi tena serê xwe li ber dîwêr rûniştibû, pelê çixareya xwe dikurisand û bala xwe dabû ser şêla wî. Komutên xwe bi ser de tewand:

”Heso axa, ma te ez nas kirim bê ez kî me?”

Dengê wî jê re xerîb ne hat. Destê xwe danî ser eniya xwe û ziq li ruyê wî nerî:

”Erê ezbenî. Ma tu ne Haydar bînbaşî yî?”

”Belê”, got û pişta xwe rast kir.

Heso da xwe ku rabe, wî ne hişt.

”De ka kerem bike mala min û çayeke min vexwe.”

Heydar piştî ku bêhnekê li halê wî nerî:

”Ma bi min dikeve ku ez çaya te vexwim û dû re jî

êşkenceyê li te û gundiyên te bikim?”
Hesoyê ku sê-çar meh bû ji dil ne keniyabû, serê xwe berda ber xwe, ji dil keniya û ji dil jî got:
”Hema pêşî tu di dê û jina min û dû re jî di dê û jina Reyis û temamê zilamên wî...e û hew!”
Haydar fêhm kir bê çi got.
Pê keniya:
”Wê ev filîm hîn pir biajo Heso axa. Lê çi fêde tu ê
290
dawiya filîm nebînî.”
”Erol Efendî rast gotiye: Hûn tirk ji mîqroba webayê jî xurtir in! We mîqrobeke wilo xist nav me ku em ê tu carî nikaribin xwe jê safî bikin!”
Haydar hîn bêhtir keniya:
”Heso bi rastî jî tu zilamekî di ser xwe re yî”, got û berê xwe da nav qelebalixê.
Heso jî da pey.
Tîman keça Kenêr li wê navê şilfîtazî kiribûn û di talda xaniyê Dasim de tibabekî baş destavêtibûnê. Laşê wê ê gewr û boz ji xwînê bûbû kulîlk. Him lê xistibûn û him jî mîna kûçikan bêwestan yek çûbû ser û yek daketibû. Qîje wîja wê digiha ezmanê hevtan! Di wê navê re Sarê û çend pîrekên din jî bi derbên wan bêhiş li erdê veziliyabûn.
Mela Salar jî ew yeka han bi xwe ne xweş anîbû. Eskeran çend qûndax li serê wî jî xistibûn. Ne miribû, lê ne ê rabûnê jî bû. Qelpaxa serê wî li ser du movikan çirandibûn; mîna gayekî serjêkirî nehişî li ber xwe dida.
Heso bêhnçikyayî xwe avêt ser û bû îske îska giriyê wî.

Pir dixwest ku biqêriya û bikira hewar hewar! Lê rewa tê ne mabû. Sêdiq tiştek tê ne hiştibû.
Bi herdu destan li serê xwe dixist û digot:
”Wey li me hêsîrên destê tirko, wey li me xwêniyê destê Reyiso, wey li me bêkesan, haho!...”
Ber bi keça Kenêr de meşiya. Tîman xwe ji ser dabûn alî û keçik hîn jî li wê navê şilfîtazî vezilandîbû. Qutikê xwe hema ji xwe kir û tev li qutik xwe li keçikê pêça.
”Wey li min kundê serê şikêran, wey li min evdal î, wey li min kerê çolan!”
Destên xwe ber bi ezmên de vekirin:
291
”Ma ez ew ê ku min bênamûsiyeke bi vê ecêbê bidîta, lolo Xwedo!” got û berê xwe da Haydar:
”Em miletekî bêxîret in, lê hûn ji me jî bêxîretir in. Heger hema piçek xîret û namûsa we heba, we wilo bi serê vê alemê de ne dikir, bavkûçik!...”
Heydar tew deng jî ne dibir xwe. Bi eskerên ku Mela Salar li erdê gevizandibûn re dixeyidî û gotinên kotî bi wan re dikir. Heso xwe gihandê û bi pêxêla wî girt:
”Ji bîr meke ku di rojekê de wê zarokên vê keçikê, di dê û jinên we tirkan hemiya...in!”
Haydar bi haweyê ku wî bixwe û nikaribe gezekê jî jê bide, lê dinerî. Pir vekirî xuya dikir ku dixwest bi ecêbeke mezin wî bikuje. Ji kerba nava xwe re diricifî. Di dawiyê de herdu lepên xwe ên ku bi qasî ên hirçekî mezin dihatin, danîn ser milên wî û wilo dewisand heta ku Heso bi erdê re kire yek. Dû re jî:

”Ji niha û deh rojan, ya hûn ê derkevin çiyan, yan hûn ê bibin pîber û yan jî hûn ê ji vî gundî bar bikin ewqas!” got û li pêpîka xwe xist.

3

Haydar bi nîvrokî re ji gund da rê û çekdaran jî bi esirkî re xwe berdan gund. Gelek caran wilo dibû. Heta rojekê mifrezeya yuzbaşiyê tabûra Nisêbînê hîn rêya Menderê derbas ne kiribû, qefla çekdarên ku ji Dêrê dihatin, gihabûn erdê axkolka binya gund jî.

Heso piştî ku Mela Salar rakir Nexweşxana Mêrdînê, keça Kenêrê ku jehr bi ser xwe dakiribû û di ber mirinê de kêferat dikir û pîra Hesîna, rêyî Nisêbînê kirin. Û di hikmê

292

du seetan de jî Meyroyê di goristana Pîr Kemêl de veşart. Lê ji bêtaqetî ew bi xwe ne çû ser gora xweha Sadiqê ku li ber destê wî mezin bûbû. Him wek qîza xwe didît û him jî bûka wî bû. Ji bo wê yekê jî pir pê diêşiya ku ne ketibû bin darbesta wê. Xelef di ber sekratê de bû. Kenêr xwe winda kiribû. Li cihê ku tîman destdirêjî keça wî kiribûn, mîna hirçekî birîndar dev li canê xwe dikir, li dor hev dizîvirî û diket û radibû. ”Waweyzê waweyzê, haho haho!...”

Qaşo Selîm ji bo ku berdilê wî bigirta xwe berdabû cem. Ji Kenêr bêhtir wî dikir hewar hewar!

Bûka Hesîna xwe di bestê re gihandibû ser bîra rêya Qesra; xwe tê werkiribû, di cih de miribû û kesekî jî ew ne dîtibû.

Wextê paleya cehan bû. Bayê geniman ji aliyê çiyê ve

zadên dêriyan dialast û toz û tirabêlka xwe di beyarên Çûva, Menderê, Zorava û Sirêçkê de dixurbiland. Ne dengê kewekî ji Qesrikê û hewdê Birxulan dihat û ne jî di bin tûmekî xernûfê û şehfelê de mexelê keroşkekê li qelaçên Zorava û Sirêçkê xuyanî dikir. Teyrê ku hêlîna xwe di zinarê newala Dojderê de çêkiribû, hêlîn berdabû. Zinarê Mêşê hingiv ne dinisiland. Baz û qertel di ser car û newal û çiyayên Omeriya ripîrût re ne difiriyan. Li wê Tora ku guran bi refan didan ber hev, êdî pêjina gurekî nema dihat. Pêşî Hatxê, dû re jî Zivingê, Gurik, Qûzo û Sirêçkê wêran kirin. Him kuştin û him jî gundên wan şewitandin. Dara ku bûbû tarîxa bûblaniyan û li Gird Elî baweşînk dikir, eskeran ew jî birîbûn. Û bi ser de jî defê sênga vî dêwî bi qezetoreyan kolabûn.

Muxtarê Sarincê keriyek pez ji teymenê merkeza Mêr-

293

dînê re gurandibû û bûbû kirîvê wî. Di wextekî de jî hakimtiya partiyê dikir. Dest danîbû ser malê hin gundiyan û ew ji gund bi der kiribûn. Di hingama ku eskeran zêç û zar mîna zebeşan di terempêlan werkiribûn, Koçerê jî, wê Koçera ku bavê wê ji Ernasê xwe li mezinahiya Birehîmê Qaso girtibû û bi nanê wî mezin bûbû, qutifî bû. Ne gihabû Nisêbînê û miribû. Pîrê di ser heştêyî re bû. Pîrebokî û sarincî ji bo ku mezinahiya pîberayetiya bûblaniyan têxin destên xwe, li himberî çend kesên menderî bûbûn yek û çi finasê genî hebûn herdu aliyan jî dikirin. Li aliyê din jî kuçûkî û domiziyan li hev şidandibûn. Ne tu exlaq û ûjdan, ne tu qedir û qîmet û ne jî tu eser ji kurdayetiya wan

mabû. Lêbelê di vî warî de Kenêr bi haweyekî din gazinên
xwe kiribûn. Li gora wî, ”heger partiyê ewqasî pê li wan
ne kiribûya, ew ê jî ewqasî nebûna kûçikên eskerk û meskerkan!...”
Resûlê çekdar çawa ku xwe bi lez gihand gund, wilo jî
bi lez çû mala Heso.
”Ha Muxbirçî Heso, ma îcar tu ê çi bersiva xwe bidî?
Haydarê ku çavên hevalan derdixîne, tepiskek jî li te ne
xistiye! Ka qaşo tu ji Mela Salar kurdtir bû. Heta bi kevjalekî
wek Xelef lêxistina herî pîs dixwe û tu jî hema ji
eskerekî tifînekê naxwî. Ma ku ev bêbaviya te hemû hîn jî
ne elametê muxbirçitiyê bin, naxwe muxbirçitî çî ye, hi?”
got û bi berstika wî girt.
Mîna vî Resûlê rihayî di nav temamê çekdaran de û
heta belkî li temamê Tirkiyê û Kurdistanê jî tu kesî nikarîbû
ewqasî karê xwe baş bikiraya. Gava ku dilê wî dixwest,
dikarîbû tahma avê bida mazotê û mazot bi haweyê
avê bi mirov bida vexwarin. Bi zarê herî xweş û ê herî pîs
294
jî dizanîbû bipeyivya. Zimanê kurdî û tirkî di destê wî de
wek lastîkê bû. Bi vir de dikişand çelpînî û bi wir de diavêt
pelqînî pê dixist. Heso bi qasî ku ji Reyis ditirsiya,
ewqasî jî ji wî ditirsiya! Wî ew kil dikir û ew jî di nav
destên wî de dilerizî. Vê carê jî qirdê wî ”teresî” pê re kiribû.
Meyroyê bêwext miribû û bi ser de jî temamê gundiyan
bi xwe re rakiribû ser mezel. Ma ku Sarê li mala xwe
bûya, qey Resul dikarîbû nêzîkî Heso bûbûya! Wê dîsa
sed û bavek jê çêkiribûya. Lê vê carê a wî lê hatibû; Heso
xam bûbû û wî jî êrîşî ser kiribû.

”Heval, wilehî û bilehî jî ez ne muxbirçî me!” got û
xwêziya xwe daqurtand.
Resûl jî piştî ku bi şiqama xwe re agir bi ruyê wî xist û
got:
”Tu nikarî xwe ji bin bêşerefiya ku te kiriye bidî alî!
şahidê te karê te ye. Pirêza te vekirî xuya dike, gelfiroş!”
lingê xwe ê rastê xist defa sênga wî û ew bi dîwêr ve eciqand.
Çavên Heso mîna ên zerzûlan lîstin û çûn xwarê. Xîze
xîz bi qirika wî ket. Nikarîbû bêhna xwe berda. Di dawiyê
de bi sûnda xwe a herî mezin sûnd xwar û got:
”Lawo, bi şêxê erdê li Bexdayê ez ne muxbirçî me; te
ez fetisandim!...”
”Diz nakeve xaniyê vala! Mij û dûman xwe li ser çiyayên
bilind digirin. Hesen yuzbaşî çima li te guhdarî dikir,
lê li yekî wek Miho”, got û vê carê jî bi bêvila wî girt û
kêra xwe danî ser.
Heso mîna pelê çilo ricifî:
”Min bikuje û bêvila min jê neke!”
Bi vê gotinê ew hîn bêhtir lê degel bû. Kêra xwe bi
295
bêvilê dewisand û dengê xwe rakir:
”Na na, ma ez wilo bi rehetî te dikujim. Guh jî di dorê
de ne.”
”De ka bihêle pêşî ez te nas bikim bê ev tu kî yî,
Xwedê ji te razî be?” got û bi haweyê ku a di dilê wî de
tam fêhm bike, bêdeng û reng serê xwe ber bi ê wî de bir
û ziq lu herdu çavên wî nerî.
Xwîn kişiyabû çavên wî ên ku hîn çewalek pirs di wan

de xuyanî dikir.
”Baş e Resûl, niha ev tu ji min çi dixwazî? Bibêje ez ê
bikim û bêvila min jê neke, ez di dexlê namûsa te de!”
Resûl bi her haweyî Heso baş nas dikir. Kêr danî ber
xwe, dev ji zirte zirtê berda û mîna camêran pê re peyivî:
”Pêwîst nake em serê hev biêşînin, bêje bê te ji kengî
de dest bi ajantiyê kiriye?”
Heso hîn ji serî de jê bi jehrî ketibû. Dizanîbû ku wê
dengê wî jî têxe teybê. Xema wî teyb bû. Guh nedayê.
Heta ji bo ku bêvila xwe bi dest ve berneda, dikarîbû di
nava sûka Nisêbînê û di hoperlorên herî mezin de xwe ajanekî
herî mezin bida xuyanî kirin. Ji xwe hîn ji zû de her
tişt ji bo wî bêmane bûbû. Qîmetê şerefê, namûs, xîret û
hesyeta ku di mejiyê wî de kemilîbû, li cem, bi qasî şeref
û namûsa ku çekdaran dianî zimên, ketibû. Li Melkemot
bûbû bele. Lê Melkemot jê direviya. Ne ew ji mirinê,
mirin jê ditirsiya. Mirov digot qey razan, xwarin û vexwarina
wî hemû bûbû hewa. Ne wek insanan radiket û ne jî
xweşîk dixwar û vedixwar. Bi qasî qarotekî kelbeşa qelaçên
Zorava zirav bûbû.
”Li ser herdu çavên min. Lêbelê ma ez xwe bikim
muxbirçî yan jî ajan? Ji we re çawa baş be ez ê wê
296
bibêjim.”
Resûlê ku bîra gotineke wilo ne biribû:
”Di eslê xwe de herdu jî eynî gû ne, lê a ku te dikir û
hîn jî tu dikî ajantî ye.”
Heso piştî ku bi hemd herdu destên wî ji ser herdu

milên xwe rakirin û serê xwe berda ber xwe, keserek veda.
Dû re jî hema bi qasî hilmekê ponijî û got:
”Ma tu dixwazî ez xwe ji kîjan salê de bikim ajan?”
”Hema ji salên hevtêyî de”, got û bi dizî pê li pişkoka teyba xwe kir.
Di vê navê re jî hevalên wî bi nav gund ketibûn û xort û zilamên ku ji ser mezel dihatin mala xwe, li ser bênderên jora gund vedihewandin. Kenêrê ku xwe ji ber wan jî vedişart bi xwe re ne gihabû xwe veşêre û li bayê bezê xwe avêtibû tor û bextê Bedrên. Lê piştî ku Bedran jî bi ser de giriyabû:
”Ez nikarim li ber bayê te rabim, wê min û kufletê min hemiyan bikujin”, gotibû û bi kufletê xwe ve mal terikandibû.
Çekdaran qul bi qul hindurê xaniyên wan nas dikirin.
Û bi ser de jî ji eskeran bêhtir dizanîbûn bê kî li ku û ne li ku ye. Kenêr ji qorziya kadînê ji nav kayê derxistibûn û biribûn.
Resûl piştî ku kaseta xwe qederekî baş ji dengê Heso dagirt û gelek tiştên nebûyî pê dan gotin, xist pêşiya xwe û berê xwe dan ser bênderan. Di vê gavê de jî Sarê ji nav mezel dabû rê û pê bi pê dihat.
Gundî li cihê ku Haydar bînbaşî serê Keyo firandibû dabûn ser hev. Ji bilî Heso û Selîmê ku di tenişt hev de rûniştibûn, her kes li ser pêyan di temenê de bû û mîna
297
mehkûmên binê zindana Diyarbekirê bêkit li Resûl guhdarî dikirin. Pîrek bi haweyekî din bûn. Mirov digot qey hemiyan dixwest ku çekdar zilamên wan bikujin; bi zarokên

xwe ve ketibûn hinduran û xeberên herî kotî bi çekdaran
û mêrên xwe re dikirin.
”Weke hûn jî dizanin, ew kesên ku eskeriya tirkan kirine
hînî muxbiriyê, bênamûsî û bêşerefiyê bûne; îcar ên ku
eskerî ne kiribin bila destê xwe hildin!” Resûl got û keleşkofa
xwe hejand.
Dilê Heso sivik lêdixist. Bi xwe bawer ne dikir ku
bikaribûya di bersiva wî de tiştekî li xêrê bigota. Him
bigota jî ji xwe ne dibû tiştek. Resûl li gora plan û programa
ku pê hatibû tevdigeriya.
Ji bilî çend xortan kesî destê xwe hilneda.
Piştî ku di bin simbêlan re beşişî û serê xwe rakir; vê
carê jî bi haweyê ku hin li ber rabin, çavên xwe li ser rêzê
gerandin û bi kîn teqnekî li hemiyan nerî. Dû re jî sênga
xwe bel kir, tena tena bi vir de û wir de çû û hat û ji nişkê
ve fûriya:
”Hûn zoravî her tim li pêşiya partiyê bûne kelem. Ji bo
wan meqsedên xwe ên genî, we her tim av di bin kayê re
meşandiye û bi dostayî gelek caran we derb li partiyê xistiye.
Hûn ne dibin pîber, ne bar dikin û ne jî we tu carî
mezinahiya partiyê qebûl kiriye. Hûn hosteyên ku derbekê
li nêl û yekê jî li bizmêr dixînin. Lê ji îro pê ve partî,
êdî wê rê nede wê korfesendiya we!”
Heso devê xwe dagirt û vala vekir. Di eslê xwe de tirsa
wî a niha hemû jî ji ber gundiyan bû. Bawerî pê anîbû ku
peyveke ne li hesabê Resûl, dikarîbû bûba sebebê kuştina
gelekan ji wan. Carina ”skût zêr” bû û heta di hin kêlîkan

de ji zêr jî bi qîmetir bû. Wilo difikirî. Dengê xwe ne kir. Resûl Bedranê muxtar di nav çavên xwe rakir û li ber sekinî:
”Te gelekî ji serekê ajanan hez dikir. Bi saloxdanan tu wî di mala xwe de vedişêrî. Ma...”
Xwîn li Bedranê ku li himberî Haydar wek bilbil peyivîbû, vemirî. Devê wî kethev û wek dîkê ku bide nav moristanê, lingek hilda û yek danî.
Resûl hîn bêhtir lê degel bû û bi fort û portan ajot ser:
”Qey tu dixwazî ez kinêsa te jî vemirînim ha, kûçik! Tu bi kîjan cesaretê dikarî yekî ku bi dehan keçên kurdan avis kirine bihewînî mala xwe! Ma te dizanîbû ku wî Reşoyê qewad, destdirêjî keça te Gulê jî kiribû û dû re jî ew li hêla Bestayê kuştibû?”
Bedran çeng bû. Ji dêvla ku wê bigota, keça min jî hat kuştin ha, ”te keça min jî kuşt, ha!” got û çitikî sekinî.
Bi xwe hisiyabû ku çewt gotiye, lê nema fêde dikir.
”Bêşerefiyê neke! Partî bi neh sed hezar marq û du sed hezar dolarên ku wî kurdxayinî revandiye û wek emanet teslîmî te kiriye, dizane!”
Devê Bedrên bihustekê vebû:
”Eeehew!”
Resûl deng ne bir xwe. Dev ji wî berda û vê carê jî berê xwe da Remo. Mirov digot qey li ber destê Haydar bînbaşî mezin bûbû; şêla wî û xeberdanên wî jî mîna ên wî bûn. Ferqa wan a ber bi çav, ev bi qasî lepekî bû, ewqas.
”Ma tu partiyê henek menek dibînî, qeşmer! Temamê vê mentîqê pê dizane ku Reşoyê bêşeref, nozdeh kilo

zêrên partiyê danîne ba te! Qemyonên cilûcaw û pertel û...”
299
Çawa ku di kêlîkên wilo de bersivandina komutanên eskeran sûc bû, bersivandina ên partiyê jî wilo sûc bû. Bersiv her tim divabû bi haweyê erêkirinê ba.
”Hevalê hêja, çewt ji te re hatiye gotin. Hevalê Şivan par bi qasî neh kîloyan bazin, hingulîsk, guhar, gerdenî û beniyên zêrên jinên pîberên toriyan teslîmî min kiribûn. Lê hema piştî mehekê jî ji ba min birin.”
Ne hişt ku behsa bê kê cilûcaw û pertelên dikandarên pîberên midyadiyan pê dabûn firotin, bike.
”Kûçik tu pir zimanê xwe dirêj dikî!” got û bi kulma xwe re ew li erdê zîzikand.
Selîm bi dizîka devê xwe bir ber guhê Heso:
”Niyeta van teresan xerab xuya dike! Ez ditirsim ku hinekan ji me bikujin.”
”Bila bi kuştinê lê ne bi bêviljêkirinê be hema!”
”Ma tu dibêjî wê Kenêr bikujin?”
”Erê. Lê tirsa min”, got û ruyê xwe ê ku ji hêsiran şil bûbû paqij kir.
Dilê Selîm jî wek ê wî sivik lê dxist. Bi sênga xwe girt:
”Kuştin kuştina mêra ye xem nake, lê ku mîna Bîçer gû dan me em ê çawa bikin?”
Heso bi destê wî girt û guvaşt:
”Hişşş dengê xwe neke! Bi telaq ku bîr bibin, wê rêxê jî tev lê bikin û di devê me rakin.”
Selîm bi qahr tiliya xwe di erdê de bir û anî:

”Ê de Xwedê ji me û wan re mezin e, dinya dû dirêj e”,
got û li Kenêr nerî.
Resûl û wî mîna du dîkên qoqo girtibûn hev.
”Cendirme jî ne mîna we ne!” Kenêr jê re digot.
Resûl bi hêrs devê keleşkofa xwe li ser hev çend care-
300
kî di zikê wî rakir:
”Ajanê emperyalîstan tew hîn jî dikare ji me re cendirme
bibêje!” got û berê xwe da hevalên xwe:
”Ji xwe re vî baş nas bikin da hûn bizanibin bê Reşo
ajanekî çiqasî mezin e! Ev suxtê wî ye. Ew Reşo vedişêre…”
Li gora Reyis, Kenêr ajanekî ku rastûrê bi CÎAyê re di
têkiliyê de bû û Reşo jî di sala ku li Nisêbînê dixwend û bi
giliyê Circîs re pazdeh rojan ketibû girtîgehê, bûbû zilamê
MÎTê; bi destê wê hatibû gihandin û beşdarî nav partiyê
bûbû. Lê piştî ku hatibû girtin, vê carê jî MOSAD û CÎAyê
ew ji MÎTê teslîm girtibûn û li dor şeş-hevt salan li girtîgehê
bi dizî ew li himberî wî perwerde kiribûn. Di nivîs,
konferans û civînên xwe de her tim wilo digot.
Kenêr fêhm kiribû ku ê kuştinê ye. Jê danexwar:
”Bindakirina ajantiya te û Reyisê te, bi daserkirina
ajantiya kurdperwerên wek min, fêrisên wek Reşo û Serdêr
ve girêdayî ye!”
Wî fêhm ne kir. Vê carê jî devê keleşkofa xwe bi textikê
eniya wî ve zeliqand:
”Çi, çi, çawa? Vekirî bibêje bêşeref!”
”Pêşî, bêşeref tu û ew Reyisê te ê ku bûye zilamê
xelkê, bi toltajiyên wek te, me dike dizê sola me; bi kûçikbavî

me berdide pêxêla hev û di hindurê mala me de me
dikuje. Adin, hûn ji me re ajan dibêjin da em bi xwe dakevin
û ajantiya ku hûn dikin, nebînin. Te îcar fêhm kir,
teres!”
Her kesî bi heyran lê dinerî û dixwest wî di dilê xwe de
veşêre. Lê ji bilî Sara ku ji kêleka mizgeftê gopalê xwe
dihejand û digot ”tu roniya herdu çavên min bî Kenêr;
301
kuro hema ez pêşî kîrê te di jina wî Hesoyê ku kumê bênamûsiyê
kişandiye serê xwe…!” tu kesî jî devê xwe venedikir
û xwe ne diavêt pişt.
Resûl bi zendê Kenêr girt û ber bi xwe de kişand.
Kenêr li ber xwe da. Wî pehînek li defa sênga wî xist. Piştî
ku bi pehîna xwe re ew li erdê gevizand, ji hevalekî xwe
re got:
”Vî gelfiroşî bi dû xwe de bikişkişînin dera han!” û
berê xwe da Sarê:
”Qeltaxa ajan û muxbiran, bes xeberan ji me re
bide!...”
Sarê bi vê gotina wî re tam ji ser xwe çû. Lezand. Lingên
wê bi a dilê wê ne kirin. Bi ketineke pîs ket. Da xwe.
Lê Meyroyê ew jî ziwa kiribû. Bi zikişkê li xwe xist.
Resûl ber pê de beziya:
”Dêya serekê ajanan, bêhna xwe fireh bike bê em ê hîn
çi ecêban bi serê we de bînin! Hûn ê xayintiyê bi gelê kurd
re bikin û wilo bi rehetî jî hûn ê karibin li Kurdistana bav
û kalan rûnin, ha!” got û çend tif têwerkirin.
Sarê jî pîştî ku gopalek li çîmê wî xist, bi gezan çû lingên

wî. Lê Resûl ji wê bi serketîtir derket. Bi herdu milên
wê girtin, hinekî kila û dahf da. Sarê bi erdê re bû yek. Li
ber xwe ket; berê xwe ji komê zîvirand, li sênga xwe xist
û devê xwe ji zehferana ku avêtibû paqij kir. Dû re jî serê
xwe xist erdê, bi dilşewatî avêt ser Reşo û ew di hewara
xwe de xwest:
”Bila mala xayin û bêbextan xerab bibe, ribatê mino.
De ka were û li halê pîrika xwe binere bê...”
Resûl ji dil hêrs bû. Diranên xwe lê sûtin û lingê xwe
bilind kir. Lêbelê pehîna xwe lê nexist, dîsa çend tif têwer-
302
kirin û berê xwe da Kenêrê ku jê re digot;
”Hema kurdayetî û tirkayetiya me û we di vê de xuya
dike. Kurdê herî bênamûs jî mîna te nikare bike. Lêdana
pîrekan karê eskeran e!...”
Sarê ji cihê xwe bang kir:
”Hey hevt topên ezmanan li deriyê bavên we ketino!
Bênamûsino, heger hema piçek hesiyet bi we re hebûya,
we ev rebenkên han bi devê tivingê li ser van bênderkan
ne dicivand û li kelikwîrkên wek Kenêr ne dixist. Wey
hezar xwezî bi cendirman û ne bi we!...”
Tahn û qurçên wê jî xêr ne kiribûn. Her kesî ji tirsa
hêkên hesinî dikirin; her kes ketibû taya ruhê xwe û mîna
hêsîran li çekdarên ku Kenêr xistibûn devê keleşkofê,
dinerî.
Resûl da ber rêzê û mîna başçawîşê Stilîlê bi serpozka
sola xwe li hestiyê çîmên wan ên birçî xist. Xortek bariya.
Wî ew da ber sîleyan. Di eslê xwe de hersê-çar xort jî dilxwazê

partiyê bûn û her tim dikarîbûn bigihana wan. Heta
çend roj berê yekî ji wan qelaçên Hatxê jî derbas kiribû;
bavê wî pê ve gihabû û ew vegerandibû.
Bi guhê Simo girt, firkand û got:
”Te pir forsa xwe bi wan herdu xayinan dikir. Te pir
zimandirêjî li himberî hevalan dikir. De îcar tiştekî bibêje
bênamûs!”
Wî tiştek ne got, lê Meshûd tiştekî ecêb got:
”Hevalo, ma gelo Reşo û Serdarkê me hîn jî sax in?”
Dizanîbû ku Meshûd çi mal e. Deng ne bir xwe. Lê
Kenêr jî bûbû xwê û ketibû êgir. Bela xwe jê venedikir.
Mîna kewekî şingalî devê wî ne diket hev. Resûl ber pê de
bazda, li bayê bezê bi alîkariya çekdaran keleşkofa xwe
303
xist hindurê şikeftika qirika wî û serê wî bi erdê ve zeliqand.
Kenêr ji derb ket û mîna keroşka ku kêr li ser stuyê
wê be, temamê canê wî ricifî. Hilma xwe di lûleya keleşkofê
re dida û distend. Dengê kufe kufa ku bi qirikê ketibû,
dawiya çaboxa erd jî derbas dikir. Hinavên Heso keliyan,
xwe bi ser hev de guvaşt û guvaşt û bi rengê xortaniya
xwe rikêbî ser kir. Lê çawa xwe çeng kir wilo jî kumişî:
”Wî nekuje û tu çi ji min dxwazî ez ê bikim. Ez dikarim
bizirim, biorim û heta bêviljêkirina xwe jî qebûl
bikim. Ez di bextê namûsa te de tiştekî pê neke!...”
Lê mirov digot qey risas niqutîbû guhên wî, ne deng
diçûyê û ne jî ji kirasê xwîna ku girtibû ser çavên wî û her
tiştî lê sor vedabû, perîşaniya gundiyan didît.
Sê çekdaran Heso li cihê ku lê kumişîbû zeft kirin û ne

hiştin ku tevbiqeliqe. Heso jî da nav û çi tiştê ku hat ber devê wî got:
”Şoreşgerino, ka qaşo we yê em ji bin nîrê zilma tirko xelas kiribana, ma ev bû xelaskirina we? Ma hûn gurên me ne, ma kîjan bênamûsên wek we, nikarin bi me? Erê bêbavino, ma ne we digot ‘me temamê çiyayên welêt azad kirine!’ Kanî çiyayên we? Rast e, çend qelaçkên me ên ku hebûn, bi saya serê we, eskeran ew jî ji ber me girtin. Mal û can û her tiştê xwe me di rêya we de feda kir, teresino!...”
Komutanê herêmê Resûl piştî ku bi ser çekdarên xwe de hilbû û bi qahr ji wan re got:
”Devê wî ajanî bigirin, di eleyhê partiyê de propaganda dike!” û çekdaran jî destên xwe danîn ser devê Heso, keleşkofa xwe hîn bêhtir di qirika Kenêrê nehişî de bir û
304
berê xwe da komê:
”Baş li min guhdarî bikin! Ji niha û hevt rojan ya hûn ê deriyên xwe heta bi dawiyê ji partiyê re vekirî bihêlin û yan jî hûn ê ji vî gundî bi nav tirkên xwe de bar bikin!...”
4
Bi rohilat re zarokekî duwazdeh-sêzdeh salî ji Zorava xwe berda Menderê. Ne kesî guh dayê û ne jî kesî hişt ku li terempêla gund siwarê. Bi ser de jî yekî erza wî şikenand. Lawik giriya û ber bi rêya Îpekê de bazda. Texsiya ku ji Mêrdînê dihat lê ne sekinî, a ku ji Qosarê dihat lê sekinî û ew bi xwe re hilanî. şifêr jê pirsî û wî jî bi îske îsk bersiva wî da. Mêrik ji Xursê bû û kezeba wî jî peritandibûn. Hêrs bû! Heta bi dawî pê li xazê kir û texsî wek mêr

kişiya Nisêbînê. Vî mirovî tam di hindurê pênc deqîqeyan de ev lawik li kolana şêx Reşît daxist. Lawik jî bêyî ku sipasiyekê bidêyê, li dû xwe nenerî û mîna çêlkewekî bi nav sikakan de sûrikî.
Qurpînî ji nava bapîrê wî hat, dilê wî sivik lêxist û defa sêngê ji hev veziliya. Guhên wî miç bûn, por lê bû wek pîjdankan, xwîn lê miçiqî û ruyê wî zer veda. Damarên eniyê mîna tayên firêzê kişiyan; xwe pêl kir, çavên wî beq lîstin. Gwîzika qirikê bi lez çû û hat, ziman nepişî û diranên xwe bi dizîka qiriçandin. Heger xwêzî danequrtanda wê bikuxuya jî. Canê wî mîna deviya ku mêr di bin de nêçîra xwe dixwar, bi carekê ve dihejhijî. Tarîxa liberxwedan û pevçûnên wî ên ku ketibûn ber pêlên salan, mîna kevirên aşan di serê wî de geriyan; zingînî û gumînî kete guhên wî û zimanê wî ê nepişî bi teqil gotin gindirand:
305
”Te got çi lawê min?”
”Erê kalo, hevalan Kenêr jî kuştin!”
Li sênga xwe xist û wek zarokan giriya:
”Ez ê çawa bikaribim xwe li ber vê êşê bigirim! Ez hemiyan bikujim jî nabe heyfa dilopeke xwîna wî! Wey xweliya hevt tenûran li serê min û bavê min be!
Ma Heso û Sarê jî ne kuştin?”
”Na kalo. Lê eskeran jî Mela Salar kuştin!”
Circîs bariya û wek teyrikekî bêserî li erdê zîzikî:
”Haho, haho! ya star, ya star! Wey li min malxerabî, wey li min bavkûçik î! Îcar ez ê wan çawa bikujim, haho!...”

Wî hîn bêhna xwe bernedabû, neviyê wî dîsa pê ve zeliqand:
”Ma ne keçika apê Kenêr jî xwe bi jehrê behecand!”
”Eeeehew!” got û bi gezan êrîşî ser lêwik kir.
Baş bû ku lawik bi dar û ber bû. Xwe ji nav lepên wî xelas kir û mîna gule di derî re firiya. Wî jî hema bi dû de, bêyî ku tiştekî ji Mîrzoyê Mitirb re bibêje, tena bêceme, fanêreyê sertazî û xwas xwe avêt der û ber bi geraja texsiyan de bêserî beziya.
5
Dema ku Circîs bi texsiyê ajot hindurê tabûra Nisêbînê û xwe avêt tor û bextê yuzbaşiyê tabûrê, Sarê jî bi nav gund ketibû û xeber ji gundiyan re dida. Resûl cercûrê keleşkofa xwe di devê Kenêr de vala kiribû û gotibû, ”ew kesê ku vî zir xayinî veşêre, wê bi aqûbeta wî here!...”
Zoraviyan ji tirsa ecêbên ku wê çekdaran bi serê wan
306
de bianîna, termê Kenêr şevder hiştibûn. Bi rastî jî gotinên çekdaran ne ên henek menekê bûn. Çi tiştên ku digotin bê lam û cîm pêk dianîn. Li Stilîlê Selîmê Kwîtanê, jina wî û sê zarokên wî ên hûrik bi sebeba ku keça wî jî mîna a Sêdiq kiribû, di hundirê malê de bi ser hev de kuştibûn. Û bi ser de jî ji stilîliyan re gotubûn, ”van ajanan veneşêrin!”
Cendekên hemiyan bi şev û rojan li erdê mabûn. Havîn bû û bêhn bi wan ketibû. Di dawiyê de çêwîş qewet ji Nisêbînê xwestibû û bi eskeran ew veşartibûn. Eynî tişt li Nisêbînê bi serê Bilalê xwediyê sînemeyê de jî kiribûn. Di devê deriyê mala wî de ew kuştibûn û ji kufletên wî re jî

gotibûn, ”gerek hûn bi ser gora wî ajanî nekevin!...”
Bi ser ne ketibûn. Karmendên belediyê Bilal veşartibûn.
Bi kurtî, li herêmê mîna Selîm û Bilal gelek kes hatibûn
cezekirin.
Bi tenê hew Heso û Sarê şeva xwe li ser termê Kenêr
bihurandibûn. Mela Salar bi êvarkî re li nexweşxaneyê
miribû û Meshûd jî bi reşayê re termê wî gihandibû Qesra.
Qereqolê heta ku ro derneketibû destûra ketina gund ne
dabûyê. Lê termê keça Kenêr hîn jî ji nexweşxaneya
Nisêbînê ne hatibû. Bi rastî ev Meshûd jî mirovekî tam
xerabe bû. Ne xweşik tiştek fêhm dikir û ne jî dikarîbû du
gotinên xweşik ber bi hev de bianiyana. Bi şev jî ku seet
hema dehê şevê derbas dikir, mirov digot qey bê mejî ye,
heyvanê serê wî ne dixebitî. Carina heta ku rastiya hin
mijaran fêhm dikir, bi kêmanî çar-pênc rojan li ser difikirî.
Gundî bi cemseya ku di ser rêya Menderê re berê xwe
dabû Zorava û bi xezeb dihat gund re, dîsa hebitîn! Dev ji
kuştiyên xwe berdan, hin bi qelêç û hin jî bi hinduran de
307
beziyan. Lê piştî ku cemseyê da navtarê û li kêleka mizgeftê
sekinî, Circîs bi mifrezeke esker jê peyabû û Mîrzo
jî bi keleşkofê da ber, bêhna wan derket û li wan civiyan.
”Termê wî mezinê me û bavê me hemiyan li ku derê
ye?” Circîs got û mîna dînan bi vir de û wir de bazda.
Hesoyê ku hema li jora wî bi ser termê Kenêr û Mela
Salar de dikaliya, bang kirê:
”Xwe li min kûçikbavî bigire û were! Û heger tu min
jî bi ser wan de nekujî, jina te li kerxanê be, de were ha!”

Sarê dengê xwe lê rakir:
”Lolo Heso, gazina xwe ji felekê bike! Em hemû jî
mîna te gunehkar in, gunehkar in…!”
Circîs piştî ku fote ji ser cendekê Kenêr avêt û serê wî
ê ji hev belavkirî dît, tam ji ser xwe çû. Bi gez û lepan êrîşî
erdê kir:
”Lawo çend ferd ax ji min re bînin û li vir vala bikin da
ez hema têr bi serê xwe dakim!” got û bi tepan bi nav serê
xwe ket.
Heso jî destê xwe dabû ber ruyê xwe, li devê Kenêr
dinerî û hişê xwe berdabû ser pêşeroja çekdaran. Ji ber ku
eskeran Mela Salar kuştibûn û esker jî dijminên riknê xwe
didîtin, ewqasî li ber ne ketibû. Circîs bi xwe jî wilo bû.
Heta li ser Mela Salar ji çavên Sarê hêsirek bê çi bû ne
hatibû xwarê. Lê ji bo Kenêr çavên xwe kiribûn girar. Di
navbera termên herduyan de rûniştibû û bi seetan gotibû
”birayê min ê axretî, tu şehîd çû. Lê de ka em ê ji Kenêr
re çi bibêjin? Em û eskeran ji sala qala û belayê de dijminên
hev in. Dijminahî bêminetî ye. Xwezî bi dilê te ku tu
bi destên wan hate kuştin û ne bi destên van ên me ên ku
ji me ketine û bi me hilketine...”
308
Circîs vê carê jî gazî her kesî kir:
”Lo lo zoravîno, hema ev esker di dê û jinên we ... in
jî dengê xwe nekin û çi ji we re bibêjin bi a wan bikin!”
Di vê navê re jî teymenê ku bi pê re hatibû, gundî rêz
kiribûn û şîret û waz li wan dikir:
”Em hemû jî birayên hev in. Dînê me, kultur û rabûn û

rûniştina me yek e. Ev dewlet dewleta me û we ye. Bêguman hin komutanên me li gora kêfa dilê xwe meşiyane û zilm li we kirine. Lê hemû jî ji teref mehkemeyên dewletê ve wê cezê xwe bibînin. Û heta hinekan ji wan dîtiye jî. Ew partiya ku bi salan we dabû dû û bi heriştê xwe ve hûn ketibûn xizmeta wê, ji aliyê rûsan û ermeniyan ve hatibû çêkirin...”

Remo gotina wî di nêvî de birî:

”Qomandarê min, gelo wê dewlet heqê wî cehkê min ê ku tîman çend roj berê agir berdabûnê jî bide?”

”Gava ku we rahişt tivinga dewletê û we ew parast, helbet ew ê jî ji bo we her tiştî bike...”

Bedranê ku Resûl jî çend hox erd nîskên wî şewitandibûn, devê xwe dagirt û xwest ku bibêje ”ma dewlet wê heqkê ê min jî nede gelo?” Meshûd rê lê girt û bi haweyê ku her tiştê komutên fêhm kiribû bi kurdî got:

”Qomandarê min, tu rast dibêjî; heyvanê dîn û îmanê bi van ên çiyê re tuneye! Ji xeynî Reşo û Serdarkê me hemû jî bêexlaq in. Erê lo, ma mirov kevjalekî wek min neqla kerê dizirîne, hi? Erê kuro, ev ên li çiyê mirov dikin xwe û xwe jî dikin mirov. Çi pisiya ku li ser ruyê vê dinyayê heye dikin û ji me re ’pîsko mîsko’ dibêjin.”

”Temam Meshûd amca, temam, em ê heyfa we ji wan hilînin”, got û li Mîrzo û jina wî temaşe kir.

309

”Hek, Mîrzo ew çi tiving e!”

”Keçê ez bûme qûnekê eskeran!”

”Kuro eyb e ji te re, em û tiving û qûnekî ha! Ribab li

bejna te tê kilê çavên min. Temamê keç û xortên vî welatî
li ber dengê ribaba te mezin bûn e û tu ê îcar here guleyan
bi ser wan de bibarînî, ha! Zû wê tivingê ji milkê xwe
biavêje!”
”Keçê bi wê ziyareta di nav şeqên te ên ku bi şev û rojê
ez tewaf dikim lê, min tu ceriband bê ka te ê çi ji min re
bigota Meleska min...”
6
Ji bilî Heso, temamê zoraviyan pîberiyek bê meaş
qebûl kirin û rahiştin sîlehan. Li gora peymana wan, bi
van sîlehan bi tenê wê gundê xwe ji çekdaran biparastana
û digel eskeran bi dû şopa wan ne ketibana. Sîlehên ku
stendin jî hemû keleşkof bûn. Lê piştî ku çekdaran cara
sisêyan jî bi roj girtin ser gund, di navtaran de şer sincirandin
û esker bi hewara wan ve ne hatin, Circîs ji nav omerî
û toriyan hin dostên xwe xistin gund; çend xweşkêş û
tematêk jî li keleşkofan zêde kir û di gundê xwe de li ber
wan veket. Di wê navê re Mîrzo jî ji hêla Kercosê û Kerboranê
hin mitirb anîn gund. Di bin mezinahiya Circîs de,
Zorava dîsa xilbe bû û têhn jê çû.
Di nav bûblaniyan de zoravî di hilgirtina sîlehên dewletê
de ên dawî mabûn. Di eslê xwe de Serdar û Reşo
bûbûn sebebên wê derengmayinê. Heger ne ji wan bûya,
partiyê mîna ku di xelkê herêmê de dikir wê di zoraviyan
de jî bikira. Heso wê tu carî nikarîba hema li himberî çek-
310
darekî kasûlî jî bipeyivya. Ji Circîs zêde bû ku him xwe ji
gund bida alî û him jî gava dilê wî bixwesta bihata gund.

Her roj qîje wîja Heso bi ser çekdaren de bû û bi ser de jî şîret li wan dikirin. Circîs di civata wan de lingên xwe radidan û zendikên xwe hildikirin. Li Cinata Miho ji herçar gundiyên ku bi ûçiliyan lîstibûn sê milyon pere stendibûn û bi seetan ew li ser lingekî hiştibûn. Erol Efendî li ser ku bi dizî li Mêrdînê araq vexwaribû, çend carekî efû kiribûn. Û li ser wê yekê jî li Nisêbînê gelek kes kuştibûn. Meshûdê ku lawekî wî jî derketibû çiyê û ji bal eskeran ve hatibû kuştin, mîna ê omerî bi dû zirandinê de ne kuştibûn. Temoyê bavê Reşo gava Reyis di teybê de peyivîbû, carekê ranebûbû ser pêyan û destên xwe dananîbûn ser hev. Li herêmê li ser wê ”bêhirmetiya” ha, mirov hatibûn kuştin. Li Zorava qedexe bû ku yekî çekdar bi jinekê re, sebeb çi diba bila bûba, bi tenê di hindurekî de bipeyivya. Sirêçkê bi Zorava ve bû, sirêçkiyan bi gulê berbero navê Reyis di nav erdên xwe de dinivîsandin û zoraviyan jî hema sûretekî wî bi dîwarê mala xwe ve danedileqandin. Bertîl û dan û stendina bi eskeran re sûcekî mezin bû. Û Heso jî ji bo ku Yuzbaşiyê Girarê him wî û gundiyên wî ji gund raneke û him jî ewqase tahdê negihîne wan, bi dinyayek pere bertil kiribû. Di civatê de wî bi devê xwe ev yeka han ji çekdaran bi xwe re digot. Tizbî ji destê Circîs ne diket û li nav toriyan jî çend malbat li ser tizbiyê ji gundê xwe celî bûbûn. Mirovê ku gotineke çort bi jina xwe re dikir, çekdaran dev û diranên wî dipelixandin. Û zoraviyan jî hema her roj gotin bi keç û jinên xwe re dikirin. Heta piştî demekê hinekan dîsa dest bi lêxistina jinê kiribûn. Digel wî heweyî, çekdaran dîsa bi wan re deng ne

kiribûn. Heso çend carekî hin xortên ku wê çekdaran ew bikuştana, ji nav lepên wan xelas kiribûn. Lê li gelek deran bi vê mebestê hin maqûlên wek Heso hatibûn kuştin. Li nav bûblaniyan xeber kultureke qedîm bû. Ji bilî zoraviyan, hin li ser vê kulturê hatibûn kuştin û ji bêgavî dev ji kultura xwe berdabûn. Li Zorava jin û mêrên pîr û navser, car carê bi qerfên bûblankî digirtin hev û ji kenan lal dibûn. Keçan terempêl diajotin û bi terektoran jî coht dikirin. Û him jî tena fîstên û devdelingê kurmancî. Carina jî keç û xort mîna dê û bav û dapîr û bapîran, diketin destê hev û direqisîn. Li herêmê mirovê ku ne daba dû partiyê an bi polîsekî-eskerekî re bihata dîtin, çekdaran bi çavên ajantiyê lê dinerîn; diçûn mala wî xwarina xwe dixwarin û piştî xwarinê jî ew di nav koma kufletê wî de dikuştin. Li midyadê û Cizîrê gelek kes wilo hatibûn kuştin. Gelek kes jî mîna mirovê kercosî rakiribûn çiyê, ji dest û lingan girêdabûn, latên mezin danîbûn ser sênga wan û bi wî haweyî kuştibûn. Lê Zibêrê zoravî bi salan wek berpirsyarê partiyê him mezinahî li gund kiribû û him jî her ji hevteyekê li ba polîsan bû. Û kesî ne tifînek dabûyê û ne jî gotineke xerab li ber guhê wî xistibû. Li her derê gava ku çekdarekî bi jin diçû mala xwe, çekdarek li ba disekinî û bi jina xwe re dipeyivî. Ev li Zorava ne wilo bû. Li Zorava çekdar li odeyekê û jin û mêr li odeyekê radiketin. Heta hin kesên wek Hesûk ji qazî ve, bi sariya sibehê re dengê xuşe xuşa ava ku bi ser xwe dadikirin, dibirin çekdaran. Jinên avis hema hema bi tenê li vî gundî

hebûn. Gundê ku ji aliyê esker û çekdaran ve telefona wî qut ne bûbû, dîsa Zorava bû. Di dema ku eskeran gav bi gav çiyayên Omeriya ji çekdaran xalî dikirin, çekdaran
312
qedexe li ser elektirîka gundekî wek Stilîlê mezin danîbûn; lê digel ku Zorava ji xwe re kiribûn mesken jî, heyvanê qedexê li ser elektirîka gund dananîbûn. Gund bi şevê mîna bajarekî diçirisand. Mîna gundên omerî û toriyan qira kûçikan li vî gundî ne anîbûn. Qerf û yarî, ken û pêkenîna ku bi carekê ve ji temamê herêmê rabûbû li Zorava hîn jî hinekî hebû. Di vî warî de serbestiya ku partiyê dabû zoraviyan, mirov dikare heta sibehê jî dirêj bike. Reyis tiştekî zêde zêde xwe aciz kiribû ku zoraviyan rahiştibûn sîlehan. Li gora wî Resûl karê xwe baş ne kiribû û ji rêya koçkirinê bêhtir rêya xwesipartina partiyê dabû pêşiya wan. Ji ber hindê ew hema ji komutaniyê xist û ji bona mehkemekirina wî ew teqeze xwest ba xwe. Lê Resûl û grûba pê re hîn ne gihabûn ser hidûd, li texma girê Kemaliyê li kemîna eskerên Haydar bînbaşî rast hatin û yek ji wan jî sax ne filitî.
Komutanê ku şûna Resûl girtibû, bi komeke giran ve du caran avêt ser Zorava û di herdu caran de jî pişta stuyê xwe xurand. Zoraviyên ku di binên xaniyên xwe de xeşîme kolabûn, zêc û zar berdan xeşîman û ji kozikên ser xaniyan bersiva wan dan. Di şer de ji gundiyan bêhtir çekdar hatin kuştin. Di eslê xwe de heger Circîs di êrîşa wan a pêşî de hevalê kuştinêba, dikarîbû gelek ji wan kuştibana. Resûl bi haweyê ku wê zoravî desthilneynin, bi hevalên

xwe ve garankî li navtara nîvê gund sekinîbûn; him gotinên genî bi wan re dikir û him jî gule li ser gule ji vê kozikê diavêt kozika din. Bi her haweyî ji tevgera Circîs xuya dikir ku ne dijminê wan bû. Çekdarên ku di gundê xwe de dikuştin, hemû jî kefen dikirin û bi limêj û terqînê ew di nav mezelê xwe de vedişartin. Digot û dibiland û li
313
ser wan digiriya.
Heso bi qebûlkirina pîberayetiyê re çend rojekî xwe da limêjê û ji ser sicadê ranebû. Lê piştî ku Sarê limêja wî bi xwe ne xweş anî û got:
”Tu ji tirsan limêj dikî pîro; eyb e ji te re, eyb! Êh, bê çi pê nakeve! Ê ne tu çiqasî limêj bikî, tu çiqasî rojî bigirî, tu çiqasî xêr û xêratan bidî, di roja haşer û mehşerê de wê dîsa têra vê xezeba ku te bi serê alemê de aniye neke! Xelk wê nehêlin tu bigihê cehnemê; li ber mêzêna xêr û gunehan te mîna rês ji hev veçirînin!” li ber xwe ket, ”ê hema ez nizam di çî wî xelkê te ê beredayî…”, got û dîsa bû ew ê berê.
Car carê bi stiranên Mîrzo re ponijî û ji nişkê ve xwe avêt himbêza wî:
”Mala Xwedê ava ku hema tu ji nav me kêm ne kir!...”
Digel ku li Zorava cokên xwînê herikîbûn, dîsa jî daweta keç û xortan li dar ket. Jiyan kultureke piralî bû û ew jiyana Reyis a ku yekalî li ber xelkê hatibû danîn, helbet heta bi dawiyê wê nemeşiya. Erol Efendî wilo gotibû.
Bi rastî jî ne pîberayetiya ku ji bo xwe rezaleta herî mezin didîtin û ne jî kuştina delalîkên ber dilê wan, rê li ber

dawetên wan ne girtibû. Ji çavekî wan şîn û ji çavekî jî şahî dibariya.

314

BEŞÊ ŞAZDEHAN

1

Serdêr bi dû kuştina Sêdiq û Hemo de xwe gihandibû Reşo û doza serhildanê lê kiribû. Lêbelê Reşo dîsa jî jê re gotibû:

”Me girêka werîs bi dest wî ve berdaye û em bê keys ketine. Binere him em ê pîsî pîsî bên kuştin û him jî wê Reyis navê me bi ajantiyê derxîne. Îcar bêhna xwe fireh bike rojên wî hindik mane…”

”Tu her tim vê gotinê dibêjî, tu derewan dikî!”

”Ez xulamê te me bihêle, bawer bike ez derewan nakim.”

”Bi serhildanê dibe ku ew ji me xurtir derkeve û me biperçiqîne. Lê em bi haweyekî bêdeng û bi rehetî dikarin wî ji meydanê rakin. Em ê bi metodên wî herênê. Ji min û Mencê re bihêle!”

”Ne tu û ne Mencê hûn ne ji wan ên ku bikaribin bi bêbextî li bêbextan xînin. Tu mirovekî camêr î. Tu bi her haweyê xwe kurdekî temam î. Axatiya kurdên êzîdî li bejna te dixwe; ji xwe re here Şingalê û bibe axayê wan. Tu ne ji wan ên ku te di nav me pêxwasan de cih bigirta. Ez li himberî te gunehkar im. Nabe, ez xulamê te me, bêbextî bi te nakeve, ji bîr bike...”

Di eslê xwe de wî bi xwe kuştina Reyis a bi wî haweyî, ji zû de xistibû serê xwe û ji dil û can xwe dabûyê. Lê

newêrîbû ew yeka han ji Serdêr re gotibaya. Ew jî ji ber ku Serdar mirovekî deqarû bû û bi ser de jî gava lê germ dibû, li tiştên ku nihênî bûn û divabû hîç nehatana gotin
315
mikur dihat û dida nav. Tirsa wî hemû ji wê bû.
Reşo di dawiyê de him dilê xwe jê re venekiribû û him jî rêya Swêdê dabû ber. Serdêr jî xwe aciz kiribû, şiqamek bi ruyê wî ve zeliqandibû, ew bêminet kiribû û ji ba dabû rê. Çûn ew çûn bû û tu carî nama bi carî hev ketibûn. Reyis hîn ji destpêkê de digel ku ji Reşo piştrastbû jî, pênc sîxur û li ser Serdêr jî, neh sîxurên xwe xistibûn dewrê. Ne bi tenê ji bona wan, ji bona ên din jî wilo kiribû. Heta li gora Serdêr, komutanê herêma Dêrsimê di bin kontrola şazdeh sîxuran de kar û barê xwe meşandibû. Lê di dawiyê de wî jî xwe kuştibû. Reyis ew metoda han, heta dawiya sala 1990î jî bi kar anîbû. Lê dû re li gelek herêman sîxur kiribûn komutan û li ser wan jî sîxur danîbûn. Heger sîxur jî ji kesên tebût bana, dibû ku Serdêr jî sê kes ji wan nekuşta û bi tena serê xwe, di çiyan de ne herimiya. Sîxuran serî lê gerandibûn.
Serdarê ku li Swêdê hatibû guhertin û di siyasetê de jî exlaqê kurdî bingeh girtibû, hîn ji roja ku gava xwe avêtibû newala Nesarayê, exlaqê Reyis û partiyê ne ecibandibû. Li ser îdeolojiyan ewqasî ne sekinîbû. Îdeolojî komunîst, faşîst çi diba bila bûba, divabû xwedî exlaqekî kurdî ba. Di exlaqê kurdî de rêz û hirmet, camêrî, malbat, civat û ”soz û bextê mêrên berê” hebû. Bi gotina soz û bextê mêrên berê re ava çeman diskinî! Li gora wî, kurdên berê

nezan bûn û ji destê wî exlaqî her tim winda kiribûn. Lê heger kurd bi wî exlaqî zana jî bûbana, tu carî wê ji ber hev ne ketibana û bikarîbana bi temamê dijminên xwe. Serdarê ku wilo fikirîbû û bi wî haweyî jî di nav partiyê de tevgeriyabû, mîna Reşo wî jî gotibû ”zeman, doktorê herî mezin e”, exlaqê Reyis ji zemên re berdabû û temamê
316
hinera xwe di nav partiyê de bi kar anîbû. Lêbelê partiyê û Reyis jî her tim rê li ber girtibûn û ew di koncalan de werkiribûn.
Serdar di demeke ku Reyis bi her haweyî partî xistibû destê xwe, çiya ji gundiyan xalî bûbûn û ên ku mabûn jî bûbûn pîber, bi tena serê xwe li himberî Reyis sekinîbû û li ber xwe dabû. Liberxwedana wî jî bi haweyê revê, veşartin û zikdagirtinê bû. Zehmetiya wî a herî mezin xwarin û vexwarin bû. Bi vir de diçû li esker û pîberan û bi wir de diçû li çekdaran û erd û çiyayên mayinkirî diqelibî. Di hindurê hevteyekê de çend carekî ji mirinê filitîbû. Carekê tîm û çekdaran çep û rast lê girêdabûn û di neqeba agirê herdu hêlan re xwe xelas kiribû. Di wê navê re Reyis jî bi rêya masmedyayê dengê xwe gihandibû eskeran û ji wan re gotibû:
”Qesasê we ê herî mezin bi tenê maye. Û heger hûn wî nekujin, hûn bêşeref in!”
Reyis Reşo bi çar sîxurên xwe ve berdabû dû Serdêr.
Reşo jî bi mebesta ku berî hin Serdêr bikujin, ling ne xistibûn bin xwe, di hindurê deh rojan de ew li çiyayê Cûdî tap kiribû û li dora wî bûbûn xelek. Pê re şer ne kiribû. Lê

Serdêr şer kiribû û bi teqîna pêşî re du kes ji wan kuştibûn. Di dawiyê de Reşo bi niyeta ku sîxur neajon ser, sîlehê xwe avêtibû. ”vaye ez têm û min jî bikuje”, gotibû û ber pê de meşiyabû. Lê sîxurê ku li pişt Serdêr çong berdabûn erdê, ew yeka han firset dîtibû; êrîşî ser kiribû û dest bi dest cercûrê keleşkofa xwe lê vala kiribû. Reşo jî hema yekser ê sîxur kuştibû, lê fermana xwe jî pê re rakiribû. Reyisê ku ji newala Nesarayê bi şev û rojê çavên xwe ji ser wan danegerandibû, dîsa li ser telefonê bû. Piştî ku di

317

her tiştî de gihabû, vê carê jî bi gotinên çort Reşo dabû ber hev û ew li wê derê ajan ilan kiribû. Dîtina Serdêr, şerê pê re, kuştina wî û telefona Reyis, hemû jî qey seetek kiribû. Lê Reşo jî bêyî ku li van hemiyan bifikire, bi bihîstina ku di hindurê çend kêlîkan de bûbû ajan, telefon di ruyê Reyis de li erdê xistibû û sîxurê mayî jî kuştibû. Dû re jî li ber termê Serdêr teqnekî baş rêz girtibû, di goreke bê kêl de veşartibû û bi kalîn û nalîn ji ba wî nihîtê ku bûbû stûna tarîxa wî dabû rê.

Menca Xerzî jî mîna Reşo û Serdêr xwendina xwe nêvcî hiştibû û hatibû nav çekdaran. Li Diyarbekirê faqûlteya tibê dixwend. Salek jê re mabû bûba doktor. Mencê bi exlaqê xwe hinekî bi ser Serdêr ve çûbû. Lê mêrxasiya wê bi qasî a Reşo û Serdêr, li odeyên axa û begên kurdan hatibû gerandin. Jineke deqarû û ewqasî jî a heyfan bû. Li ba wê efûkirin hema hema tunebû. Qenc, xerab kê çi bikira divabû bedêla wê bigirta. Ji nav çekdaran a ku berî her kesî li dijî Reyis derketibû û hişk çûbû ser, ew bû. A ku

berî her kesî li ser kuştina Reyis fikirîbû û fikira xwe ji çend komutanên hevalên xwe re gotibû, dîsa ew bû. Li gora ku wê digot, di destpêka hatina wê de Reyis pir li ber dabû ku wê li newala Nesarayê bihêle û tu carî wê neşîne çiyê. Qebûl ne kiribû. Û ji ber wê yekê jî Reyis çavreşî avêtibûyê. Carekê bi ser Reşo de giriyabû:
”Bihêle da ez bi dostayî wî bikujim!”
”Îcar ku bi te hisiya?”
”Bi min bihise jî wê dengê xwe neke û dîsa min bide xatirê spehîbûna min, ehmeq!”
Reşo pê re ranebûbû.
Mencê ji Reşo berê xwe girtibû. Him jî lawik. Reşo li
318
gundekî Torê, ew di mala hevêrkiyekî ku dostê bapîrê wî bû bi cih kiribû. Herdu bi tenê diman. Dû re jî rapora wê a ku di şer de hatibû kuştin, bi destê xwe nivîsandibû û ji Reyis re şandibû. Reyis jî bi haweyê ku bawerî bi rapora wî anîbû tevgeriyabû û bêhis û pis refek sîxurên xwe bi dû şopa Mencê xistibû.
Sîxuran cehdeke mezin kiribûn. Di holê de xelatên bihabilind û terfî hebûn. Kê berê destmal birevanda û xwe bigihanda hitikê, bi tûşa pêşî re wê komutaniya herêmê bi dest xista û bûba melhema birîna dilê Reyis. Sîxuran bi Reşo re li dor pênc-şeş mehan di nav êgir de bi çavgirtînkê lîstibûn û çi tiştên ku ji dest wan hatibû kiribûn. Çendek ji wan şewitîbûn. Reşo xwedî tecrûbe bû. Bi salan li dijî wan tekoşîn dabû; gelek ji wan bi metodên mafyayî kuştibûn û dabûn kuştin.

Dema ku Reyis bi eşqa wan hisiyabû, Mencê li newala Nasarayê çend mehekî zindan kiribû û zindankirina wê jî ji Reşo veşartibû, li himberî Reşo bi qozê xwe ê dawî rabûbû û li temamê rêyên ku bi haweyekî xefî ew daba kuştin geriyabû. Reşo jî bêyî ku tiştekî li xwe çêke, xwe ji bûyera Mencê û sîxurên bi dû xwe de xazî kiribû û li vir û wir sîxur kuştibûn. Gelek ji wan jî nebedî kiribûn. Lê di qumara vê carê de winda kiribû. Vî mirovê ku tu carî tedbîr ji destê xwe bernedida, bi şev bi carî Mencê ketibû û dawiya xwe anîbû. Piştî ku ji ba Mencê dabû rê, sîxuran bêdeng hema girtibûn ser malê. Osê hevêrkî di cih de kuştibûn û Menca ku zikê wê gihabû ber devê wê, bêhiş xistibûn û yekser berê wê dabûn binya xetê.

Tarîxê dîsa Kenêr rast derxistibû. Li gora wî, Reşo û kesên wek wî xeteyeke tarîxî kiribûn ku mîna Serdêr û

319

Mencê tevnegeriyabûn û ji ber wê yeka han jî wê tarîxê ew bikirana gunehkar, qatil û qirdikên herî mezin! Gava ku sîxuran bi reşaya şevê re Menca Xerzî di navbera qereqola Doksanbîrê û Çûva re binxet kiribûn û xwe li Qamişlê girtibûn, wî çaxî jî Reşoyê Sarê bi koma xwe ve kişiyabû ser tabûra Midyadê, çekdaran li Serdêr girêdabûn, Reşoyê Mencê di nav xiramkên Şahbanê de mîna dê û bavê xwe, di pevçûna li himberî mirinê de têk çûbû û hilma xwe ya dawiyê dabû!

2

”Hoowehh li vê ecêba kesnedîtîîî! Min çi kir û çi ne kir, ez çiqask bûm û ez bûm çiqas, ez ji ku rabûm, di ku re

çûm û ne çûm, giham ku û li ku ketim hahooo! Erê, ez îro
baş pê dizanim bê min jî mîna gelek hevalên wek xwe
têkçûyî di ku de xete kir. Heyhattt! Pevçûna ku karekterê
min bû, piralî bû. Lê mixabin di wê pevçûnê de tenê ez bi
eskeran daketim û heta ku me Reyis ne kir imperetor, min
jî guh neda tevger, dan û stend û rabûn û rûniştina wî. Ez
bi neqebên tarîxê ve hilperikîbûm û min xwe ji siyasetê
bêrî kiribû. Ew çi aqil bû? Ez beredayî bûmmm! Zilma
tirko perde xistibû navbera min û Reyis; min ji eskeran pê
ve tiştek ne didît, Mencêêê! Lê dîsa jî ez gunehkar immm!
Ez qatilê te, Serdêr û Kopo meee! Min dikarîbû devê wî
biçirandaaa! Min dikarîbû bi haweyekî ew bikira toz û li
ber bayê Enqerê berdaaa! Haho, wey li minêêê!
Di pevçûnê de min winda kir hevalê. Lê ma di liberxwedanê
de jî gelo min winda kiriye, min bi xulamê? Na,
na, naaa! Îcar tu dizanî delala min, di jiyana min a siyasî
320
de xeta min a herî mezin ew bû ku min bi a we ne kir.
Zînovyev, Buharîn û bi sedan kesan jî wilo gotibû. Hooweh
li vê ecêba ku min bi serê xwe û we hemiyan de anî!
Min xeteyeke pir mezin kir! Lê ji wê jî mezintir xeteyeke
din heye Mencê. Û ez ê wê tu carî nekim! Di êşkenceyê de
baz jî dikare bibe mirîşk û mirîşk jî dikare bibe baz. Min
bi sedan baz û mirîşk dîtin. Ez ê xwe nedim girtin. Ger di
êşkenceyê de ez bibim baz jî ew ê dîsa min sax nehêlin. Û
jiyana bi mirîşkî jî ji xwe mirine, hevalê. Ji kuştinê pê ve
tu rê ji min re ne maye. Li vî alî jî û li wî alî jî. Di roja îro
de kuştina min a di cepheyê te de, wê bi kêrî tiştekî bê

dêya Reşoyê Mencê…”, di şikeftên Himyanka Gurik de, Reşoyê Sarê xwe wilo mehkeme dikir û bi tepan li serê xwe dixist.
Gava Haydar girtibû ser gund, Reşo jî bi Kenêr re di xeşîmeyê de bû. Herduyan bi hev re li qîr û hewarên gundiyan guhdarî kiribûn û axîn kiribûn xwîn!
Li Zorava dostê Reşo bi tenê hew Kenêr mabû. Bi dû kuştina Serdê de, di halekî ne xweş de xwe gihandibû mala dostê xwe û piştî ku her tişt ji dest xwe berdabû, ji dil guh dabû ser şîretên wî. Bi hev re ketibûn devjengê û kevirên mezin bi ser dawa hev de gindirandibûn. Kenêr jê hatibû bêvilê. Di wextê ku Reyis ew kiribû ”Erkanê Herb” û xwe li ”imparatoriyê” şidandibû, Kenêr jê re gotibû: ”Bitrî ji gayê cot re jî namîne û hûn bitir bûne. Hûn çavsoriyê li xelkê dikin. Hûn bûne karwanê devan û we daye dû kerekî. Ker pîsiya karwên bêhn dike, dimîze û karwan jî li bendî heta kero dîsa bide rê, disekine. Kuro wê ev kerê ku di bin her kesî de ye bi we, me hemiyan biqedîne û dû re jî li we vegere!...”
321
Kenêr li dora milyonekê mark û dolar û gelek çekên mezin ji bo rojên teng jê xwestibûn û ew jî bi aqilê wî keniyabû. Hişê wî hatibû serê wî, lê piştî ku her tişt winda kiribû û ketibû xetera mirinê. Reşo hîn ji zaroketiya xwe de hilfa xwe berdabû ser Kenêr; ew şêwirmendekî mezin dîtibû û di bin tesîra wî de dest bi şoreşgeriya xwe kiribû. Di mijarên cidî de her tim pê şêwirîbû, lê her tim jî wek xwe kiribû.

Reşoyê Sarê piştî kuştina Serdêr, ji bo ku di Reyis de çiqek bikira, pir serê xwe êşand. Lê cûkên ku li himberî wî avêtin, her gav ker û pik hatin. Fikirî ku ew jî mîna hevalên xwe li ser ”ajantiya” xwe binivîsîne û herwiha xwe bike zigurdê herî mezin. Lê bawerî pê ne anî ku wê Reyis wî efû bike. Xwest ku ber bi başûrê welêt de bireve. Lê ji ber ku hin kesên mîna wî revyayî li başûr ketibûn destên tîman û çend kes jî nebedî çûbûn, tirsiya û dev ji wê fikarê jî berda. Çekdar û eskeran çiya zeft kiribûn û şer jî bi yekî tenê ne dibû. Wê çawa bikira? Reyis bi hêz bû, li her derê dilîst û ew jî bêkes û kûs bû û cihê lîska wî jî şikeftên Gurik û Qûzo bûn. Lê dîsa jî divabû vî mirovê ku bi destên xwe bi sedan esker kuştibûn, di zaboqên herî tarî re derbas bûbû û di qûncikên herî tarî de sîxur nebedî kiribûn, rêyek ji xwe re bidîta. Tu xilq tune bûn ku mifte lê nehatibana. Ev gotinên wî bûn.

”Daxwaza Reyis, seetekê berî seetekê min bêdeng bikuje û a eskeran jî bi saxî girtina min e. Gotineke min bi te re heye xwefiroş; lê ez ê çawa xwe bigihînim te?...”

Xwe teslîmî çekdaran bikira, Reyis saniyekê ew sax ne dihişt; xwe ne kira derdekî din bû. Esker û çekdar li erd û ezmên lê digeriyan. Û mêrik jî ne mar bû ku xwe bi axê

322

bidebiranda. Hema ji destê xwarin û vexwarinê jî maba wê bimira. Ne Kenêrê ku li nav rez jê re nan vedişart û ne jî Kerîmê ku nameyên wî bi vir de û wir de dibirin, li jiyanê bû.

”Ez ê çi xweliyê bi serê xwe dakim! Ez ê xwe di nav

kîjan tirafê de vezilînim!...”
Gava mirov jîr û zana û bi ser de jî mêrxas baya, rojên teng li ber mirov çibûn. Him wilo gotibû û him jî li xwe mabû heyirî. Bi roj diket hindurê tirbê û bi şev jî xwe dida ber kêlan. Ew Reşoyê ku bi şevê ji rojê çêtir dizanîbû bigeriya, bêhna xwe berda û baş bifikiriya, şev û roj tev li hev kiribûn. Çend carekî xwe berda guhera Mexelan û bi ser gevzeka xwe û Mencê de bi seetan giriya. Hepsa Darê hema li tenişt wî bû. Bêhna xwe berneda û bazda wê bigihayê. Bi meqseda ku efwa xwe ji Serdêr bixwaze, carekê da xwe û çû. Lê ji qereqola ku di gund de hatibû avakirin cesaret ne kir xwe bigihîne hepsê. Ji serê gir bi Serdêr re peyivî û polîpoşman vegeriya.
”Haho min çi kirrr! Kanî ewqase keda minnn!...”
Tarîx dijwar bû û bi ser de jî xwe bi agirê zemanê wî qemirandibû. Bihîstibû ku gundiyekî di xirbeyên Şahbanê de termikê tifalkekî dîtibû û li nav goristana Xirbê Zil veşartibû. Terqîn ji nava wî hatibû û mîna ku ew tifalkê Reşoyê Mencê bi xwe bû, digiriya û dikir hewar hewar! Erê ew tifalkê ku belkî wî jî devê kolordiyan biçiranda û yan jî bûba mezinê miletê kurd, ê wî bi xwe bû.
”Wey li minêêê! Mencê niha tu pir bi wê dergûşka xwe diêşî! Ooofff!...”
Giriyê guran jî bi halê wî dihat. Lê tarîx ji guran jî hartir bû. Hîn çil sal ne kiribûn. Û di hindurê çend mehekî de
323
pîr bûbû. Porê wî baş weşiyabû û ji ê mayî jî tibabek sipî bûbû. Ew çepilên wî ên dirêj, bi qasî qûndaxa keleşkofa

wî kin bûbûn. Hestî û çerm mabû. Bêhna miraran ji laşê wî difûriya. Bejin û bala dirêj lê bûbû gopal û mîna serxweşan dihejhijî û diçû.
”Aqilê min nema tiştekî dikişîne; ez fêhmkorî bûme. Qîma min nayê ku dawiya min jî wek serhildana min wilo pîs bigere! Divê ez rêyekê bibînim. Lê rêyek çawa?”
Reşo bi qasî ku li ser sebeban disekinî ewqasî jî li ser dûmahîkê disekinî. Sebeban dawiyeke bêrûmet lê anîbûn û ew di nav gemara zemên de fetisandibûn. Temamê hişê xwe berdabû ser ku dawî hema hinekî bi rûmet biqediya û di wê navê re jî çend gotin ji Reyis re bigotana.
”Serdar min efû bike. Nabe. Tu û bêbextî, ha! Tu axayê min û bavê min û temamê sûlala min bû!...”
Bi kuştina Serdêr re mîna ku dawiya dinyayê hatibû, ji her tiştî bêhêvî û destê wî ji her tiştî sar bûbû. Kuştin ji bo xwe xelasiyeke mezin didît. Lê berî wê divabû bûba cin, yan jî bi haweyekî dûrî aqilan xwe bigihanda Reyis. Di vir de tam teqinîbû û qeweta xwe bi carekê ve berdabû ser mejiyê xwe. Di dawiyê de tiştê ku Reyis qet li ser ne fikirîbû, bîr bir; bi kêfa dilê xwe û aqilê xwe re çend dengan keniya û got:
”Min carekê winda kir. Û heger ez ne kurdperwerekî mezin û xwîna mêrxasên kurdan di xwîna min de ne geriyaba, min ê di vê carê de jî winda bikira...”
Reşo bi banga sibehê re di besta Domiza re li hidûd xist û bêdeng derbasî binya xetê bû. Xwe berda Qamişlê; hema di cih de texsiyek kirê kir û rast berê xwe da newala Nesarayê.

324
3
Danê sibeheke tebaxê bû. Çekdar him di pişta rez û
him jî di zinarê Mêşê de Li ber Heso û Sarê veketibûn û
geft li ser geftê li wan dixwarin. Û Heso û Sarê jî berê xwe
dabûn Pîr Kemêl. Meyroyê û Keyo bi hev re çend şev berê
dîsa hatibûn xewna Heso.
Tîrêjên roka ku rast xwe berdidan çol û beyarên newala
Nesarayê, bi ser qelaçên Zorava de meyl kişiyabûn.
Dengê gabelekan, şalûr û zeloran ji nav rezê Hesoyê bûblanî
û guhera Mexelan bi navtêdanên Reşoyê Sarê û
Menca Xerzî re bûbûn yek û di binê konê Reyisê rihayî de,
dilê evîndaran dialast. Sura bayê sibehê ji ser serê çiyayên
Omeriya, Xerza, Botanê û zozanên Serhedê di şikeft, berqef,
kozik û çeperan de disûrikî; dengê qîr û şîqe şîqa
lawên bavan bi xwe re hiltanî û di guhên Reşoyê Sarê û
Menca Xerzî de dicivand. Qîje wîja wan bû. Mencê ji aliyekî
ve ”xwîn bi xwînê! Heta bi mirinê şer û pevçûn bi te
û tirkên te re, kurdfiroşo!...” û Reşo jî ”bila bimire mala
xayintiyê!...” digot. Ne bêhna kulîlkekê ji axê dihat, ne
bihusteke şînayî hebû û ne jî dareke bi şax û per diyar
dikir. Ji her aliyê vê newalê bêhna kizûr û barûdê difûriya.
Pûş û pelaxê girtibû ser gorên bê kêl. Li vir pir xilt û gornebaş
hebûn. Ji konê Reyis û hinekî bi wir de, mirov ji
qulên wan nikarîbû gavê biavêta. Ka ew kevokên ku bi
şev û rojan li ser wan dihatin peyivandin? Û ew refên bilbilên
ku digotin? Ezman ji teyrik û tilûran xalî bû. Ji bilî
bazê ku di kêleka Reyis de li ser maseya di rengê xwînê

de xwe dabû ser hev û bi mitale xuya dikir, li erdê pêjna
çûkekî jî ne dihat. Mewdel bi lingê baz ê rastê ve bû.
325
Girêdayî bû. Di ruyê erdê de mîna devê maran hawêrdor
qelîştek vebûbûn. Gêrik pir bûn. Pêşî jî ewqas hebûn.
Çend kerên bi sebil li pişta kon sekinîbûn. Xwînê li sebilan
vedabû. Ji kon, reşê bergîlekê jî xuya dikir. Ji bereta
kûçikê ku çend roj berê şewitandibûn, bi tenê qesefa sêngê
mabû. Kûçik li meqerê filistîniyan çend gez nan xwaribûn.
Berete li ser mextela komutanê herêma Botanê
Bahoz bû. Bahoz ji Silîva bû. Birayê wî jî li çiyê kuştibûn.
Mextela wî çend gavekî li jêra Reşo diket. Mirov tu ferq
di navbera akademiya wan û kavilên Qûzo û Gurik de ne
didît. Çend xirbek bi hişkeberê lêkirbûn û ser wan bi mircaqan,
pûş û pelax û axê girtibûn. Pûtê Reyis wek senemekî
li himberî akademiyê li ser dikeke bilind çikilandîbû.
Pût xwerû zîv bû. Ji bilî koma çekdarên ku binê konê erebî
dagirtibûn, ewqas jî bê sîleh li derdora kon di temenê de
sekinîbûn. Jinên çekdar di piraniyê de bûn. Heta mirov
dikare bibêje ku ji sê pişkan du pişk jê ew bûn. Bi hejmar
çend kes ne tê de, hemiyan jî maddayî xuyanî dikirin. Servekirî
bûn. Û hema hema yekê jî porê xwe ne şikenandibû.
Ji dengê Mencê û Reşo pê ve deng ji tu kesî ne dihat.
Car carê Reyis û hakim û sawciyê ku di çep û rastê wî de
rûniştibûn, bi hev re dikirin piste pist, ewqas. Hakim keçeke
sipehî û serhedî bû. Lê sawcî sirûcî bû. Sawciyê berî vî
torî bû. Ji mehkemekirina Mencê û Reşo reviyabû û hevta
çûyî li vir hatibû kuştin. Termê wî jî şewitandibûn.

Hêdî bi hêdî dinya germ dibû. Sipiyên ku mîna gêrikan girtibûn laşe Reşo û Mencê, agir bi canê wan dixist! Xwas bûn. Gêrikan dev lingên wan dikirin, lê wan di eynê xwe dernedixistin. Ay û ûyek ji bo xwe kêmaniyeke mezin didîtin. Şerwalê Reşo zîvar zîvarî kiribûn. Kevnekotekî
326
çakêtan bi ser fanêreyê bin cilan de lê bû. Porê Menca sertazî li gwîzên xistibûn û libadeyekî erebî bi ser fîstanê wê ê şîfonî de lê kiribûn. Lê dîsa jî eniya vê şehlewenda guhera Mexelan, di nav van cilên wek qîrê de mîna heyva çardeh şevî xuyan dikir. Zendê Reşo ê çepê di êşkenceyê de şikenandibûn. Pir zor dida xwe ku zendê xwe ê daliqyayî nelebitanda. Ser dev û ruyê wî hemû pelixandibûn û bêvila wî dax dabûn. Mîna vî wilo bi serê Mencê de jî anîbûn. Daxa li bêvila wê ji a Reşo hîn jî mezintir bû. Çavên herdu xwîniyan girêdayî bûn. Dest û lingên wan jî. Du gavekî ji hev dûr bûn. Pir xwestibûn ku di devê çapiliyan re ba jî hema awirek di Reyis re bifirandana. Mehkemeyê çavvekirî kuştina wan qebûl kiribû, lê Reyis li himber derketibû. Herduyan ne hevdu û ne jî Reyis dîtibûn.
Mencê û Reşoyê ku li ser pêyan bê talde li nêzîkî ”Moristana Şoreşê” sekinîbûn, bêhemdî xwe ditewiyan û lingên xwe bi erdê ve didewisandin. Gêrik li dora wan zîz bûbûn û bi haweyê ku hevdu bi nêçîra xwe bihisînin, bi lez diçûn û dihatin û gez ji lingên wan didan. Li ser vê moristana mirovxwir girêdayî gelek kes ji bal van gêrikên ku bi qasî kêzikan girs bûbûn, hatibûn xwarin. Gêrikan komutanê herêma Colemergê yê sala 1992an, di çil

deqîqeyekî de kuştibûn.
Keçek bariya!
”Hûn hemû jî hatine firotin!” got û dewam kir.
Pêl li komê ket. Reyis dengê xwe ji ê wê bêhtir hilda:
”Wê dêlika ajan, qehbika ajan, qeltaxa ajan hema bikujin!”
Çend çekdaran piştî ku Esmera batmanî dan ber qûndaxan,
kulm û pehînan, ew avêtin ber yekîneya kuştinê.
327
Yekîna ku ji bo kuştina Mencê û Reşo li wir amade bûbû,
dest bi dest li ser kirin û ev keça wek çinarekê bê can li
erdê vezilandin. Çend xortên ku xwe dadan cendekê wê,
mîna mirarekî ew bi dû xwe de kişkişandin pişta kon.
Yekîne ji yazdeh kesan pêk hatibû; hemiyan jî hîn nuh
xeta simbêlan rast kiribûn. Sisê jê xerzî, ji van ên xerzî
yek jê biraziyê Mencê bû; dudu jê torî, dudu omerî û ên
din jî bûblanî bûn. Pismamekî Reşo jî di nav van de hebû.
Reşo bi haweyê ku ji mirinê natirse, di nava bêdengiyê
de dengê xwe rakir:
”Ma gelo ne eyb e ku mehkemeya we ji a tirkan piçûktir
be? Mehkemeyên wan digel ku ewqasî cenewar in, dîsa
jî dihêlin ku qurban gotina xwe a dawî bibêje.”
Her kesî çavên xwe berdan ser Reyis û guhdan ser devê
wî. Reyis jî piştî ku bêhnekê fikirî, bêyî ku bi kesî re bipeyive
destê xwe bê keys heliqand. Destê wî li devê hakimê
ket. Wî li xwe ne kir tiştek û dîsa bi tirkî da nav:
”Bihêlin bila ev ajanê CÎAyê bibêje; ka em ê binerin bê
wê çi gûyî bixwe! Lê xeberdana wî bila deqîqeyekê negire!”
Bi gotina wî re sawcî rabû ser xwe û ji cihê ku lê rûniştibû

got:
”Ajanê CÎA û MOSADê, tu karî deqîqeyekê bipeyivî!”
Reşoyê ku dengê Reyis kiribû bi kêf got:
”Du gotinên min hene:
Yek, ez dixwazim seetekê bi Mencê re ya li pêş çavên we û ya jî di odeyekê de razêm…”
Wî hîn gotina yekê ne qedandibû, sawcî bi hêrs pê ve zeliqand:
”Ha ji we re ha, de ji xwe re ajanan nas bikin! Bêşeref
328
lawê bêşerefan! Heval hînî vî exlaqî dikirin. Kurdan keçên xwe teslîmî wî dikirin û wî jî bi keçan re, yanî bi namûsa gelê...”
Mencê bi lîlandina xwe re dengê sawcî fetisand:
”Eferim beranê mino! Tirsonekino, kurd wiha mêrxas in, ha!”
Reşo piştî ku dîsa dest pê kir, Mencê sekinî:
”Dudu, ez ê kuştinê me ji ber ku min dikarîbû termê te bi ên generalên tirko re di helîkopteran de rêyî Enqera te bikira û miletê kurd bi wê kuştinê derxista ronahiyê! Lêbelê min ne kir û bi ser de jî min tu kirî imperetor! Û tu jî ê kuştinêyî ji ber ku hîn ji serî de tu ev xayin bû!...”
Reyis dîn û har bû! Ji cihê xwe pekiya û êrîşî ser yekîneya kuştinê kir:
”Qewad lawên qewadan, ma qey hûn jî ajan in! Li wan bireşînin!...”
Çekdarên ku di bin destê Reşo re derbas bûbûn, gotina wî ne kirin dudu. Bi qahr berê keleşkofan xistin textikê

eniya wan û bi hilmekê re dawî li xwe, imperetoriya Reyis û temamê pevçûna xwe anîn!
Di vê dema ku xwîna Reşoyê Sarê û Menca Xerzî di herxên newala Nesarayê de hevdu girtibû û bi lez dimeya, xwîna Heso û Sarê di koncal û kortikên besta Zorava de meyabû jî.
329
SEROK ALTAXUS
Laleş Qaso

XEZAL

Sîma Semend

XEZAL
Sîma Semend
Çîrok
Tîpguhêziya ji kirîlî: Şefîk Kaya
Weşanên Nûdemê

Weşanên Nûdem: 26
Xezal
Çapa Yekem: Êrêvan
1961
Çapa Duwem: Stockholm
1996
© Weşanên Nûdem
Pergala bergê û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê:

88592-26 X
ISBN:
91
Navnîşan:
Termov.
2tr.
52,
176 77 Jarfalla-Sweden
Tel û Fax:
8-583 564 68

XEZAL

Bihar bû. Bihara Elegezê ya kin û bi gulan xemilandî, bû. Yên çûne Elegezê dikarin wê wextê wek cinetê xweş bi bîr bînin. Ew dikarin wê dema ku kulîlkên bînxweş dibişkifin, wê dema ku bîna gul û sosinan li her alî belav dibe, bi bîr bînin. Ew gulçîçekên ku ji meriv ra dibişirîn. Lê ew xulexula ava kaniyên sar, ku li deşt û mêrgan belav dibe û heta digihîje ber perrê çiya û baniyan? Ew cîhê ku çîveçîva çivîk û qebeqeba kewan jê kêm nabe, dengê çivîkan, qebeqeba kewan tevî dengê stranên qîz û xortan dibin û bi pêlên hewayê ra diçin, heta ku digihîjine cîhên dûr...

Ew ciyê wek cinet, gundê Elegezê ye. Çarnikalên Elegezê çiya û banî ne, ku kolxozên çîl û qerqaş ji meriv va têne xuyakirin. Ew çiyayên Elegezê... Xelkên wir gişk xebathez in û bi marîfet in. Serê siban, şeveqê herkes bi lez û bez, ber bi xebatê va, ber bi deşt û cîhê kolxozê va diçe.

Sibeyeke biharê ya xweş bû, kolxozvanên gundê Elegezê ber bi xebatê va dilezandin. Du heval, Karê û Xezalê jî bi lez diçûne xebatê. Lê Karê melûl bû. Xezalê lê nihêrî ku Karê melûl e û xeber nade. Hema jê pirsî, got:

- Karê, tu çira wisan î? Ma diya te û bavê te nahêlin?

Xeberdana Xezalê hê di dev da Karê got:
- Ax Xezal, ez îşev qet ranezame. Me heta nîvê şevê wisan di ber hev daye; bavê min nahêle.
Wî kitêbên min gişk qelaştin, tu çi bêjî anî serê min û diya min.
Bavê min dibê, "Na, nabe ku qîza min êdî bixwîne, wê heta koma (polê) dehan xwendiye, bes e. Qîz çi ye, ku di xwendinxaneyên bilind da bixwîne!".
Gava ku Xezalê ev yek bihîst, weke ku risaseke sar ji serî heta binê lingan pê dabûye, ricif hatê; çavên wê tijî hêsir bûn lê, xwe zeft kir. Karê, wê hemêz kir, ew da ber dilê xwe û di ber dilê wê da. Xezalê got:
- Karê, tu jî mezin dikî, dikî efsane. Ma çi dibe, wî jî carekê got?
Ji te weye bi rastî nahêle? Bavê min jî digot "Ez nahêlim", lê ez û diya xwe bi lavan, bi rica hatinê; bi qurban, bi heyran heta ew qayil bû. Rihê me pê ra kişiya. Tu qet hêvî û gumana xwe nebire, ê bihêle. Ez ê jî bêm jê lava bikim. De beşera xwe xweş bike. Wisan lêv, loperan neke ez nikarim bi vî mirûzî bi te ra bêm, ê bêjin çika me şer kiriye.
Wê Karê hemêz kir, maçî kir û herduyan bi ken li çavên hev niherîn. Te ê bigota herduyan jî dixwest bigota:"Hevaltî çiqas şêrin e".
Di wê demê da li pey wan dengê reperepa lingan û xeberdanê hat. Gava ji para zivirîn bala xwe danê ku xebatkarên koma wan in.
Qaçax û Baxço nêzîkî wan bûn û gotin: "Siba we bi xêr!" û tevayî çûne deştê.
Xezal û Karê nêzîkî hevalên xwe bûn û bi ken gotine wan:
- Selam hevalino, ji we ra qewet be!
Wan jî bersiv dan, gotin:
- Selam, li ser çavan, li ser seran!
Paşê yekê pirsî:

- Gulino, hûn li kuderê bûn, hûn ji bo çi bi derengî ketine? Wele erri bê we melûi in;
Berpirsiyarê karkeran Avagyan got:
- Bi rastî, hûn gulên birîgada me ne.

Wan jî got:
- De bes e, bi me henekan bikin, niha rindtir e ku em bixebitin.
Herduyan bi hev ra wisan gotin û bi kêfxweşî dest bi karê xwe kirin.
Karê û Xezal bi kel û cehd dixebitîn. Wan şalik ser şalikê pincar ji nava zeviyê top dikirin û vala dikirin. Heta Qaçax û Baxço komek dicivandin, dibirin serê kewşen. Wan lodek dinê bilind dikir.
Heta wextê nanê nîvro ew wisan bi hewes dixebitîn, lê Qaçax û Baxço te hew dinihêrî wa ye sekinîne, bi hêrs bi hev ra xeberdidan. Wextê nanê nîvro herdu, êdî kêrt û kal bûn jihalketî bûn. Ew rûniştin û bi hev ra axivîn.
Baxço bi hêrs li Qaçax nihêrî û gotê:
- Qaçax, ev gişk şaşiya te ye, te em kirine vî agirî. Divê tu li bal Xezalê bixebitî. Ku te bi ya min bikira, em ê li bal Sînemê û Meyro bixebityana. Ew bi xwe mîna van bê Xwedêyan nîn in. Tu dibînî çiqa rehet dixebitin? Van malik li me xerab kiriye. Pişta me kirine ber me. Kuro, tu qet bi ya min nakî; Xezalê tu caran te nastîne. Weleh perda reş hatiye ser çavên te! Tu nabînî ew qet nizane tu heyî yan tuneyî. Lê ez ji te ra rastiyê bêjim: ew qet sêva devê te nîn e! Kuro, ew ê te tî bibe ser avê û tî bîne! Ew qîz ne li gor te ye, naşîtê naşît! Tu çi dibêjî mehrum, tu bi mêraniya xwe nikarî bigihîjî xebata wê. Tu nagihîjî wê ka binhêre em ketine. Em êdî ketine lê, wan lodeka bi qasî bejna te bilind kiriye û newestiyane jî...
Qaçax berê xwe da wî û got:
- Baxço, ma ne bes e? Min carekê ji te ra gotiye: "Gere ez vê qîzê bixwazim. Heke ew min nexwaze jî ez ê wê birevînim. Ez ê... ez ê...

Di wê demê da xebatkaran gazî wan kirin, ku herin xwarinê bixwin.
Xezal û Karê jî hatibûn. Xebatkar gişk civiyane serhev û dest bi xwarina xwe kirin.
Berêvar bû, ji bal kolxozvan vedigeriyane malê. Ji dûr va dengê kolxozvanan yê şêrîn, dengê kilamên qîz û xortan dihate bihîstin.
Kevaniyên kolxozê bêdrokên wan di mil wan da, ber bi şûna çêlekan va diçûn, Xezal û Karê jî, ji xebatê dihatin.
Gava Xezal hate malê diya xwe maçî kir, rûnişt û nanê xwe xwar. Te digot qey diya wê dixwest jê ra tiştekî bêje. Lê dinihêrî û careke din di ber xwe dida. Gava Xezalê xwarina xwe xwar, xelas kir, diya wê gotê:
- Diya Qaçax Henê, li mala me bû. Gelek xeber di ber min ra avît, di derheqa te da. Lê min tiştek jê ra negot. Wê paşê bi ken got: "Em ê di nêz da bibin xinamiyê hev!". Ew ê van rojan xwazgîniyên te bişînin.
Gava Xezalê ev yek bihîst, hêrs bû û ji diya xwe ra got:
- Dayê, gere te jê ra bigota, bila badîhewa neyên, bila xwe sivik nekin û bila li wî kurê xwe Qaçax e çi kureder e jî şîretekê bikin.
Ew hê zaro ye, gede ye. Ew çi ye, zewac çi ye? Çav bi bejn û bala kurê xwe ketine lê, nizanin dara pûç e. Yekî bê hiş û feresat e. Dayê, em bi hev ra li cîhekî dixebitin û ez wî pirr rind nas dikim. Wisan jî cankesir e, wisan jî qure ye. Tu ê bêjî ew e ku heye. Ez heta wî didim xebitandin rihê min dikişe. Ew jî zaf ji min vedikişe. Lê, xebatkarên din, kesek nikare jê xeberde. Bersiva wan dide û wan bêhurmet dike. Hema ji ber vê yekê jî rûmeta wî li ber çavên min ketiye. Ji min ra wa tê ku ew nanê para min dixwe; Pirr bêhesiyet e.
Diya wê got:
- Lê Xezala min, mala wan xweş e, çira tu di derheqa wî da wisan difikirî; ew hê cahil e, ê bi aqil bibe. Ez diya te me, bi min xortekî ne xerab e.

- Ax, dayê can, wextê min û mêrkirinê nîn e. Min ji te ra gotiye, ez dixwazim bixwînim. Ez hê zaro me, ez ê bixwînim, bibim doktor.
- Doxtir?
- Erê, anê can, ez ê êdî nehêlim ku serê te bêşe, ez ê ji te ra cure cure dermanan hazir bikim. Tu ê vexwî û sax bibî.
Diya wê got:
- Qîza min, gelek baş e, bi rastî tu tiştekî pirr pak fikiriyî. Lawo, hûn çiqas bextewar in. Hûn di welatekî weha azad da dijîn!
Di orta mêr û jinan da ferq tune. Lê qîza min berê... Tiştekî eyb bû, ku qîz di derheqa xwendinê da bifikiriyana. Hema belengazan hinekî çavên xwe vebikirana, ji dinê fêm bikirana, hema ew didane mêr. Qet pirs nedikirin gelo qîz dixwaze yan naxwaze. Heke dê û bavê wê bixwestana êdî qîz çi bû! Ew didane mêr. Ew ne mêrkirin bû, weleh hema hema ew difrotin. Te dît va êvarekê pênc-şeş giregirên gund hatine û dest bi kirrîn û firotina xwe kirin; bê razîbûna qîze. Bavê qîzê digot: "Bîst pez e, qelenê qîza min" an jî panzdeh hezar. Bavê kur û qîzê heta nîvê şevê di ber hevdu didan.
Paşê, wexta razî dibûn, gazî qîzikê dikirin, gustîlkekê, tiştekî pê va dikirin û diçûn. Êdî nedipirsîn gelo ê pêşeroja wan çawan be. Lawo, ew bêbext bûn. Niha cahilên wisan çûne. Te bidîta, hinekan xwe ji kerba dikuşt, hinekan jî nikaribûn di destê mêran de îdare bikira, carkeke din vedgeriyan, dihatin mala bavên xwe. Yên ku ji derdorên xwe şerm dikirin, emrê xwe wisan bi derd û kul derbas dikirin. Aha lawo, heyata me ya berê ev bû. Hûn bextewar in, hûn bextewar in, hûn di vî welatê azad da dijîn.
- Erê dayê, ez razî me, ez ji jiyana xwe zaf razî me. Ji bo vê yekê em deyndarê Lenînê mezin û Partiya Komunîst in. Gereke em ji bo xebatê qeweta xwe nehêvşînin. Divê em rind bixebitin, ku di vî welatê xwe yê serbest da komunîzmê çêkin.
- Lawo, Xwedê bi te ra be! Heke tu hebekî min şa bikî. Min ro-

jên giran, derd û kul pirr dîtine; ez zaf hatime zêrandin. Heke tu

di dewsa wan derdan da bi dermanekî diya xwe şa bikî, qîza min?
Xezal nêzîkî diya xwe bû, ew hemêz kir.
- Erê dayka min ya ezîz, ez ê hemû tiştî bikim. Heta ji destê min bê ez ê dayka xwe ya ezîz şa bikim. Ez niha mezin bûme û hemû tiştî fêm dikim. Ez ê wisan bikim, ku rojên xwe xweş derbas biakim. Ku hezar heb xweziya xwe bi Xezala te bînin.
Zeynebê van gotinên qîza xwe bihîst û di dilê xweda şa bû. Ji şabûnê hêsirên wê mîna taviyên teyrokê dibariyan, gote qîza xwe:
- De rabe, rabe kevoka min bes e, rabe Xwedê bi te ra be êdî nîvê şevê ye, rabe û razê. Da tu sibê zû rabî, delaliya min.
Gava Zeyneb rabû, hê tarî, berbanga sibê bû. Ji xew rabibû, ku here tewla dêwêr, lê gava dîna xwe da ciyê Xezalê, mat ma. Xezal piştgirêdayî li ser ciyê xwe rûniştî bû û kitêb di dest da, dixwend. Ew wisan niqoyî nav xwendinê bûbû. Diya wê qet texmîn nedikir, ku Xezalê hê şiyar e; xwe nêzîkî wê kir, li kêleka wê rûnişt, got:
- Xezal, qîza min, ne tu gune yî, çira weha bi serê xwe dikî, çiqas rojê halê te ev e, hê çavê sibê ronî nebûye tu rûniştiyî û dixwînî?
Xezalê çavên xwe yên reş mîna hebên tirî ji kitêbê da alî, li diya xwe niherî û ew hemêz kir, got:
- Lê çawan dayê can? Meriv bê zahmetî nikare bigihîje mirazê xwe. Ez dixwazim bibim doktor ji bona vê yekê jî lazim e biçerçirim, bixwînim, hîn bibim da bikaribim îmtîhamên (azmûnên) qebûlkirinê bidim.
Zeynebê kire niçeniç û serê xwe hejand, got:

- De Rebê alemê mirazê te bîne cî û ev cefayê te daye li haşê ne-
çe; lawo, ez çi bêjim?
Diya wê van gotinan got, rabû û çû.
Xezalê bala xwe dayê heta wextê kar hê wextê wê heye, careke
10

mayin niqoyê nav xwendinê bû. Wê saetekê wisan xwend. Gava
lê nihêrî êdî wextê xebatê ye, rabû, hahaka ew der danehev, der û
sivder gezik kirin, bêdrok hilda û çû avê. Ew li wir rastî Karê hat,
ku ber bi mala wan va dilezand. Gava wê ji dûr va Xezalê dît, lê
kire gazî:
- Xezal, bilezîne, dereng e!
Ew bi lez nêzîkî wê bû. Herdu bi tevayî çûne malê. Xezalê avê
valayî kurnê kir, devikê kurnê girt û du-sê nanên tendûrê yên loş
hilda, çû navmalê. Diya wê dew dikila, got:
- Dayê, ez va diçim. Ji bona taştê çi bi xwe ra bibim?
Zeynebê hahaka çû û ji sîtla ku qatix tê da meyandibû, toyê ser
mîna zolê çerm ji ser girt, kire nava nanê loş, pêça û paşê hinek
rûnê berkilê jî kire navê, pêça û da Xezalê, got:
- Ha qîza min, de here heta nîvro diya te dê nanê te bîne. Xeza-
lê nan ji destê dê girt û ji kîlerê derket. Di sivderê da ew rastî Me-
cîd, bavê xwe hat, ku pez û dewar rastkiribû, vegeriyabû û hatibû
malê. Mecîd ku çav bi herdu hevalan ket, bi ken got:
- Siba we bi xêr, qîzên delal! Hûn dilezînin da herne xebatê? De
herin, herin wextê we û xebatê hindik ma. Hûn ê du-sê mehên din
vegerin, herin xwendinê û me tenê bihêlin.
Keçikan ji hev ra gotin: "Xwezil bi wê rojê" û çûne ser karê
xwe.

Gava ew gihîştine ciyê xebatê, hêweze ketibû nav xebatkaran, li ciyekî top bûbûn, tu kes nedixebitî. Xezal û Karê li nav çavên hev niherîn, dixwestin pê bihesiyana gelo çi bûye. Lê herduyan jî taqet nedikir ji hev bipirsin. Bi wî awayî herdu jî kerr û lal çûn bal hevalên xwe. Paşê kifş bû, ku çi qewimî ye. Xebatkar gişk li Qaçax û Baxço civiyabûn. Serê Baxço girêdayî bû; di ber laçikê ra xuna gewez dabû der. Wî xwe bi vir da bi wê da li badikir, lê ew bernedidan. Qaçax jî xwe dirêjî wî dikir, lê ew jî bernedidan. Qî-
ii

zikan ji Xezal û Karê ra gilî kirin, ku Qaçax bi piyan hatiye deştê û çawan di nav hêşînayî da razaye. Baxço hatiye, dîna xwe dayê, gotîye: "Here malê, hinek an jî berpirsiyar te bibîne ne baş e!". Hema di wê demê da ew rabûye, çêrî Baxço kiriye û hîtek hildaye, li nav qafê Baxço xistiye. Gava xebatkar vê yekê dibînin, nahêlin li hev bixin, gazî yê berpirsiyar dikin.
Ev ne cara pêşîn bû, ku Qaçax ev nerehetî dikir. Loma jî, ji Xezalê ra ne tiştekî teze bû. Di wê demê de, ji dûr va dîtin ku berpirsiyar û çend xebatkarên din ber bi wan tên. Keçikan dîsan li hev nihêrî berpirsiyar li Qaçax û Baxço niherî, paşê pirs û pirsyarin ji xebatkaran kir. Wî gote karkerên din ku ew bixebitin. Lê, Baxço û Qaçax herine gund. Paşê got, ku bila xebatkarên din jî gişk bêne civatê. Êvarê dîsan berpirsiyar rabû ji çend xebatkarên din jî pirs kirin. Paşê got ku karkerên mîna Qaçaxê tiral û serxweş ji kolxozê ra ne lazim in. Serokayetiyê qerar girtiye, ku nehêlin Qaçax di kolxozê da bixebite; heta hişê wî neyê serê wî, li ser piya nesekne, nikare bixebite. Xebatkaran gişk ew qerar baş dîtin. Xezalê soz dabû Karê, ku êvarê, piştî xebatê, here mala wan û

di derheqa xwendinê da bi bavê wê ra xeber bide. Gava ew gihîşte ber deriyê wan, dengê merivên nenas ew dan sekinandin. Ew gavi-kekê li ber derî sekinî, paşê çû hundir. Di sivderê da ew rastî diya Karê hat. Gava ku wê Xezalê dît pirr kêfxweş bû. Wê Xezalê bire navmalê, bal Karê. Karê medekirî bû, ku mêş di ber ra biçûya ê perçe perçe bibûya. Ew ber bi Xezalê hat, xwe avîte pêsîra wê û bû îskeîska wê, got:

- Xezal, min ji te ra nedigot bavê min nahêle ez bixwînim? Te dît gotinên min çawan rast derketin? Di ser da jî min dide mêr! Min dide yekî wisan ku min ew di xewna xwe da jî nedîtiye, ez ni-zanim kî ye, kî nîne. Çipîn ji derî hat, Biroyê bavê Karê ji der va bi ser van gotinan va hat. Gava wî dît ku Karê digirî damarên eniyê ii

tevlihev bûn. Irrîneka wisan jê hat, te ê bigota ew di wê saetê de perçeperçe bû. Wî çavên xwe li Karê cinû kirin û dîsan kire irrîn. Bi hêrs got:

- Qancix! Ma bes nîn e, tu min bêrûmet dikî? Tu heta koma de-han çûyî, te kuta kir êdî bes e! Ez nahêlim tu herî xwendinê, ew jî li Erêvanê û bi tenê di nav mêran da... Haho... ma qey min serê xwe daniye, ez di bin ax berên sar da me, erê? Kîjan qîz ku dix-waze bi tenê here bixwîne û li Revanê, bê xwedî ye. Lê ez Biroyê Şemo me, sax im, ne mirî me, ez nahêlim qîza min tenê here cî-hên dûr. Na, qurba, ev yek nabe. Xezalê di kur ra ev yek bihîst? Ji hêrsan êdî nikaribû gelek tişt rehet xeber bida. Xezalê got:

- Apê Biro, ev deh sal in ez te nas dikim, têm diçim û weke qîza malê me, min tu caran bawer nedikir, ku tu ê gotinên wisan bêjî. Xezalê ev gilî û gotin, jê ra got û bi kelogirî nêzîkî Karê bû, ew

maçî kir û bi dilşewatî gotê:
- Karê, delaliya min, gotinên te rastbûn, min nizanîbû bavê te...
Wê xeberdana xwe kuta nekir û di derî va derket.
Wê şevê heta berbangê xew nekete çavên Xezalê. Ew difikirî ka gelo ê halê Karê çi bibe. Karê jî wê şevê helbet qet raneza, bi girî, bi axîn û keseran şevê derbas kir. Terîbana sibê ew rabû hahaka kincên xwe li xwe kir, gustîlka ku kiribûne tiliyê heliqande qutiyê û bêdrok hilda, çû avê. Ew wisan difikirî, ku ê Xezalê li wir bibîne, lê na. Xezal hîn nehatibû avê. Lew hê pirr zû bû. Bêdrokên xwe tijî kirin, por û poşman vegeriya malê. Gava ew hat diya wê êdî ji xewê rabûbû. Dema diya Karê wê dît şa bû, bi ken gotê:
- Qîza min, çi li te qewimî ye, tu vê tariya sibê çûyî avê? Tu şevê dinê dereng ketî nav ciyê xwe; tu hinekî ji xwe ra razayî?
Karê bersiva wê neda û çû hundir. Malê paqij kir û çû bal Xezalê. Ew hefteyek bû, ku Xezal nediçû xebatê, xwe hazir dikir da çendeyekî dinê here Erêvanê, îmtîhana qebûkirinê bide.
13

Ber xezalê tijî kitêb û defter bûn, dinivîsî û dixwend. Gava ku wê Karê dît, ji şabûna lingên wê erd negirtin. Ber bi wê çû û ew hemêz kir, got:
- Wîîî... Karê, te çi biaqilî kir, ku tu hatî. Min êdî nikarbû bixwenda. Rast e min li defterên xwe dinihêrî, lê hişê min li bal te bû, de zû bêje tu çawan î? Wan wê êvarê çi anî serê te?
Karê got:
- Xezal, ji bo çi ez nebêjim. Tu nizanî wî çi kir, ez dame mêr!
Kuta bû, çû. Wî çawan xwest wisan jî kir, ez niha nizanim ez ê çi bikim. Bêje, ez çi xweliyê li serê xwe bikim?

Xezalê nizanîbû çi bersiv bida, çi bikira. Wê bi dilovanî li Karê nihêrî û got:
- Karê, xwîşka min, ez dikarim çi bibêjim. Me qerar girtibû, ku weha nebûna, niha jî bikaribim çi bikim? Bavê te mêrekî wisan e bi xebera xwe tenê dike; ew dixwaze çi bibêje tu jî bi ya wî bikî.Wan gelek xeberda, paşê Karê rabû, çû xebatê. Lê Xezal li malê ma û ji bo îmtîhanan xwe hazir dikir.
Çend rojan pişt re, hevalên Xezalê hatin, ew bi rê kirin. Tev heval û hogirên Xezalê, Qaçax jî hatibû birêkirina Xezalê lê, Xezalê qet guh neda wî. Qaçax kerr û lal li wê dinherî û qelûn li ser qelûnê dikişand.
Meha Tebaxê bû. meheka germ bû, di bin bayê germ da belgên daran yên hêşîn hêdî diçûn û dihatin. Di vê mehê de tu li ber deriyê kîjan înstîtûta Erêvanê binherî, tu ê bi sedan şagirt bibînî. Yên hatine ku îmtîhanan bidin; di wan xwendegehên bilind da bixwînin.
Li ber derê înstîtûya doktoriyê civiya bûn û pirs didane hev. Ji meriv wetirê dixwestin zanîna hev bipîvin, hev dicerbandin. Li ber derê odeyekê, bi qasî sî»çel qîz û xort civiyabûn. Wan ji kîmyayê îmtîhan dida. Ji nav wan pêcn-şeş xortan îmtîhanên xwe da-
M

bûn û puanên baş stendibûn lê, hê jî tu kesî yên pirr rind nesitendibû. Xortekî dêmqemer di qelîşteka derî de li odeyê dinihêrt û got:
- Ez dizanim ew qîzika bejnbilind ê pênc bistîne. Wisan tê kifşê ku wê xwe hazir kiriye.
Yekî din jî bersiva wî da, got:

- Distîne bila bistîne, tu dibêjî qey ê jî hesabê me bistîne.
Bi van gotinan ra ew qîzika bejinbilind ya çavreş ji salona îmtî-
hanê derket. Sûretê wê mîna hebên hinarê sor bûbûn, ji şabûna ni-
zanîbû çi bikira. Hema hevalên wê li dora wê civiyan û pirs jê ki-
rin:
- Te çi sitend?
Wê got:
- Pênc!
Qîz û xortên cem gotinê:
- Pirr baş e.
Keçik zêde nema, got:
- De bi xatirê we, ez ji we ra serkeftinê dixwazim. Piştî îmtîha-
nên mayin em ê rastî hev bên.
Yekî got:
- Xezal, em hev bibînin.
Rojên Tebaxa germ bi vî awayî derbas bûn. Xezalê ji berêva îm-
tîhanên xwe zaf rind dan û bîst û pêncê Tebaxê tev xelas kirin.
Rojtira mayin nav û navnîşa wan şagirtiyên ku hatibûne qebûlki-
rin li dîwarê înstîtûyê xistibûn. Xort û qîz li ber wan lîsteyên na-
van civiya bûn. Lê nîvê wan jî medekirî û nîvê wan jî bi eşq bûn.
Xezal jî li wir bû. Wê li listeyan nihêrî û navê xwe dît. Ji şabûnê
madê wê yê bedew guherî. Paşê tevî hevalên xwe, ku di wextê îm-
tîhanên qebûlkirnê da hev nas kirihûn, di kuçeya Abovyanê ra
berjêr bûn. Wan herduya qerar dabûn, ku wê rojê baş bigerin û bi
15

hev ra herne tiyatroyê.
Roja mayin Xezal bi dilekî şa çû Elegezê û pêrapêra çû cem Ka-

rê. Wextê karê pê hesiya ku ew hatiye qebûlkirin, bi dil û can hevala xwe maçî kir û pîroz kir. Di nav wan çend rojên ku Xezal li gund ma dîsan rihet nema hertim diçû cem karkerên hevalên xwe û komekî dida xebatkaran.
Sih û yekê Tebaxê bû, Xezal tevî hevalên xwe li ber otobosê sekinî bû, xeberdida; paşê xatir ji hevalên xwe xwest û li otobosê siwar bû. Otobos hêdîka bi rêket. Paşê ba girt, di nava deşt û çiyayên Elegezê ra, ber bi Erêvanê rê girt. Piştî çend saetan Xezal ji otobosê peya bû, li tramvayê siwar bû û ber bi razanxana înstîtûyêçû.
Yekê îlonê, saet heyşt û nîv bû, reng û rûyê bajarê Erêvanê bi carekê va hatibû guhastin, soqaqên wê bi xort û qîzan tije bûbûn. Yên ku bi ken bi hev ra xeberdidin û ber bi înstîtûyan, û mekteban ve diçûn. Xezal jî di nav wan da bû. Ew tevî hevalên xwe ber bi înstîtûya xwe ya jê heskirî ve diçûn ji wan re şêrîn şêrînn derheqa Elegezê da şriove dikir.
Saet heyşt bû, zengilê salona dersa pêşîn lêxist lê, ew ne zengilê mektebê bû. Ew zengil ji bo yên ku teze hatibûn bû. Ji bo wan xort û qîzên ku wê salê ji bo xwendina bilind hatibûne qebûl kirin, bû. Bi vî zengilî ji Xezala Kurd ra ijyaneke teze vedibû.
Di dersxaneke beşê doktoriyê da, xwendevan li ser kursiyan rûniştibûn. Di nav wan da Ûris, Ermenî, Gurcî, Azerbeycanî, Kurd û ji miletên mayin hebûn. Gişka mîna yek merivekî guhdariya rektor dikir. Piştî dersê, Sêvê û Xezalê milên xwe kirine milên hev û bi eşq ber bi razanxanê ve çûn.
Rojên xwendevana li pey hev derbas dibûn. Pirr tê derbas nebû helbijartinên civata teşkîlata komsomolan hat, Xezal ji bo katibiya teşkîlata kursiya wan hat helbijartin. Xezalê xebata mexûlqeti-

yê jî dikir û alîkarî dida hevalên ku ji dersan li paş diman.
Rojekê, di civata teşkîlata komsomolê da, xwendekaran pirs danîn, da Xezal komekiyê bide Ahmo û Anîkayê. Paşê dihat xuya kirin, ku Xezalê ew çawan dida xebitandin wê ew ji bo îmtîhanan amade dikirin. îmtîhanan dest pê kiribûn. Emekê wan hersêyan vala neçû. Civat rast dibêje: "Tu çi biçînî, tu dê wî biçînî". Wan îmtîhanên xwe zaf rind dan.
Rojekê Ahmo, nêzîkê Xezalê bû û got:
- Xezal, min bilêtên opêrayê kirîne, were em tevayî herin?
Xezalê got:
- Tu dizanî, ku sibê îmtîhana me heye, paşînê hetanî em vê jî nedin ez naçim tu cîhî. Divê tu jî neçî, niha here careke mayin dersa xwe rind bixwîne. Em îro naçine cîhekî.
Rojtira dinê, îmtîhanên xwe pirr baş dan û hema wê şevê, tev bi hev ra çûne operayê.
Piştî operayê bi eşq xeberdidan û ber bi razanxana xwe diçûn.
Lê Xezal û Ahmo hêdî hêdî di dû wan da dihatin. Ahmo digote Xezalê:
- Xezal, ez tu caran, di jiyana xwe da hevaltî û dilovaniya te, ji bîr nakim; wê alîkariya ku te da min... Xezal, ez dixwazim wextê betlanê, havînê ji te ra nameyan binvîsim. Hêvî dikim ku tu ê bersiva min bidî?
Xezalê got:
- Ev çi gotin
Ma meriv bersiva nameyan nade? Helbet ez ê
e?

bersiva nameyên te bidim.
Êdî gihîştibûn razanxanê. Xatir ji hev xwestin û ber bi odeyên xwe va çûn. Ahmo ji nişka va kire gazî:
- Bibexşîne Xezal, tu ê kengî herî?
Xezalê bi dengekî kubar got:
- Sibê na dusiba. De şeva te bimîne xweş!
17

Wê şevê Ahmo qet raneza di ber xwe da digot:"Sibê na dusibe" û careke din difikirî. Ew ji nişka va rabû di nav ciyê xwe da rûnişt. Wî xwe bi xwe digot:"Na ez ê sibê bêjime wê, êdî bes e, çiqas min xwe kerr kir. Na, ez êdî nikarim îdare bikim. Ez ê bêjime wê, yan na du rojên din pê ve dê here!".
Ahmo rabû lembeyê vêxist, kaxez danî ber xwe û dest pê kir ji Xezalê ra name nivîsî. Wextê nameya xwe kuta kir, careke din jî xwend.
Ahmo dîsan name xwend, xelas kir. Paşê qat kir, kire bin balgiyê xwe, ku sibe bide Xezalê. Bi wê fikrê jî raza. Sibê zû rabû, ji bin balgî nameya Xezalê derxist, careke din jî xwend; lê vê carê lê xweş nehat, qetand. Xwe bi xwe got:
"Na, wiha nabe, gereke ez xwe bi xwe bêjimê. Dibe hingê ew fêm bike, ku ev kaxez nikare derdê dilê bi evîn yê şewitî bêje?".
Ahmo wiha fikirî û ji malê derket. Wextê ew derket Xezal û Sêvê jî peya dibûne jêrê, zembîl di destên wan da diçûne bazarê. Wextê Ahmo ew dîtin êdî ji bîr kir, ku ew bi çi fikrê ji malê derketiye û beşerxweş ber bi wan va çû, got:
- Siba we bi xêr, vê şeveqê wiha bi lez hûn ê bi ku da herin?
Gotin:

- Em ê herne bazarê, dixwazî tu jî were?
Ahmo bi eşq tevî wan bû. Ew di rex Xezalê da diçû, ji wî wetirê dinya ya wî ye. Gava gihîştine bazarê, mêwe kirîn û vegeriyan, hatine malê. Bi rê va Sêvê got ku ew ê saet di yekê da here malê û ew çû.
Wextê ku Ahmo û Xezal tenê man, wî teze bi bîr anî, ku ê çi bêje Xezalê. Lê hema di wê demê de Xezalê gote Ahmo:
- Tramvay hat, de em herin.
Ew çûn û Ahmo nikaribû jê ra tiştek bigota. Rojtira mayin sibê zû çû oda Xezalê ji bo ku wê bi rê ke. Ew çû odeya wê, sibexêrî
18

da Xezalê û gotê:
- Xezal, êdî saet heyşt e, zû bike em herin.
Xezalê got:
- Ez jî li hêvîya te bûm, ez hazir im.
Ahmo, Sêvê û Xezal di nav panzdeh deqan da gihîştine ber otobosê. Wî hûrûmûrên Xezalê bi cîh kir û peyabû. Xezalê bi destê wî girt û got:
- Ahmo, bibexşîne, ev du roj in ez zahmetê didime te. Lê bisekine, tu çira wisan melûl î, te çima rengê xwe avêtiye, dibe tu bêkêf bî?
Ahmo got:
- Na, Xezal na, ez zaf baş im, lê...
Xezalê destê wî berneda û got:
- Çi lê? De bêje, tu çira nabêjî, ma tu ji min şerm dikî, çi ye?
Ahmo serê xwe kir ber xwe û got:
- Na, ez niha nikarim tiştekî bêjim, wextê vegerê ez ê her tiştî ji

te ra bibêjim, tu dê hingê bizanîbî. Sêvê li nav çavên Xezalê nihêrî û wê jî li nav çavên wê. Xezal sor bû û bi lez li otobosê siwar bû. Paşê otobus bi rê ket. Sêvê û Ahmo sekinîn û li otobosê nihêrîn; ew otobosa ku Xezala wan heskirî ji wan bi dûr xist, ber bi deşt û mêrgên Elegezê bir.
Ahmo li kêleka Sêvê sekinî bû û bê deng û his ji dûr va li otobosê dinihêrî, wî ji bîr kiribû, Sêvê li bal wî ye. Ew ketibû nav mitalan. Ew li wir ewqas sekinî heta ku otobus ji ber çavên wî wenda bû. Paşê serê xwe kire ber xwe û kesereke kûr kişand. Di ber xwe da got:
- Çû, miraza min çû, Xezala min...
Sêvê keniya, ew wê çaxê veciniqî, li Sêvê nihêrî û şerm kir. Sêvê milê xwe kire ber milê wî û got:
- Tu ji min şerm neke, ez xwîşka te me, de niha em herin, de-
19

reng e. Zêde nefikire, Xezal ê dîsan bê. Sêvê bi dilovanî gotê û bi hev ra çûn. Ahmo hate malê hûrûmûrên xwe top kirin, karê xwe kir û ew jî sibetirê çû Artaşatê, mala xwe.
Ew hefteyek bû, ku Xezal hatibû gund. Diya wê nedihişt ku bi ciyekî da here.
Her êvar ew li kêleka dê û bavê xwe rûdinişt û bi wan ra di derheqa jiyana xwendekariyê da, di derheqa Erêvanê û delaliya wê da, di derheqa Sêvê, mala bavê Sêvê, di derheqa dê û bavê wê agahdarî dida dê û bavê xwe. Digot:"Gelekî bi merîfet in, kesên qenc in.. Wê wisan jî digot: "Dibe ku Sêvê du-sê rojan bê bal me". Wê timî pirs ji dê û bavê xwe dikirin, pirs Karê dikir. Ew sê-çar meh bûn ku Karê li Çamûşvanê, bi mêr bû. Xezalê pirr dixwest

ku ew bidîta lê nizanîbû bi çi teherî. Wê rojekê diya Karê dît û jê pirsa Karê kir. Pê hesiya, çendekî dinê ê wê bînin zeyê. Xezalê ku ev yek bihîst pirr şa bû û bi eşq hate malê; gote diya xwe. Diya wê jî gelekî şa bû, lew wê jî ji Karê hes dikir. Xezal çendekî di malê da ma, lê tebatî nedihatê. Hevalên wê dixebitîn û ew nikaribû li malê rûnişta. Wê qerar da ku here xebatê da komekî bide hevalên xwe. Wê wisan jî kir. Roja heyştan sibê zû rabû, gote diya xwe here deştê û alîkariyê bide hevalên xwe.
Wexta ew çû deştê û mexseda hatina xwe ji hevalên xwe ra got, ew pêşî qayil nebûn, bi Xezalê ra şer kirin. Li gor wan ew hatibê betlane, nehatibû kar. Lê wexta Xezalê gote wan, ew ê du mehan li wir bimîne û dixweze bixebite, hevalên wê hê qayil bûn.
Ji wê rojê hetanî roja çûyina xwe Xezal, di kolxozê da xebitî. Êvaran wexta dihate malê jî, ji diya xwe ra şêrin şêrin xeberdida. Lê wextê dikete nava ciyan, dikete nava xeyalan, Ahmo dihate ber çavên wê û gotinên wî diketine bîra wê:"Na, vegere, paşê...". Tava nîvro însan diqjiland. Ji gund dengê kalekala pez ku teze ji çêrê vegeriya bûn, dihat. Pezdoşan (bêrîvan) dilezand, ku bigihîji-xo

ne bêriyê. Kebaniyên malan dilezandin da nanê palan zû zû bişî-nin û paşê jî herin goma pez. Di wê demê de otobosa Erêvanê gi-hîşte gundê Elegezê. Merivên di otobosê da tev peya bûn. Ji hemi-yan derengtir qîzeke nenas ji otobosê peya bû. Hema dihate kivşê, ku ew e ne ji Elegezê ye, lew li dorberê xwe dinhêrî. Di wê demê da çend zaroyên biçûk ber wê bezîn. Qîzikê gazî wan kir, tiştek da wan û ji wana pirsî, gelo ew Xezalê nas dikin an na. Zaroyan go-tin ku ew Xezalê rind nas dikin û dizanin ku li ku derê jî dijî. Ew

di pêşiya wê ketin û ew birin ber derê Xezalê. Hingê diya Xezalê li bêriyê bû. Gava wê dît, ku qîzek ber bi mala wan va diçe û birek zarok di pêşiya wê da ne, pêra pêra tê derxist ku ew qîzik ne ji wan deran e. Gava ew nêzîk bû, qîzikê selam da wê û pirsa Xezalê jê kir. Hingê wê jî pirsî dibe ku ew Sêvê be. Qîzik keniya, Zeynebê ew hemêz kir. Keçikê got:

- Dayê can, rast e ez Sêvê me, te çawan tê derxist, qey Xezalê ji te ra gotiye, erê?

Zeynebê jî eniya wê maçî kir, got:

- Lê çawan, delaliya min, Xezalê herroj di derheqa te da şor dikir. Min êdî ji gotinên wê dizanîbû tu qîzeka wiha yî. Lê bisekine te çira xeber neda me, ku tu ê bêyî? Tu dizanî îro çendeyeke nameyên te nedihatin, ew ber xwe diket.

Sêvê careke mayin ew hemêz kir û got:

- Rast e, min xeber neda we, ji ber ku min nedixwest ez zehmetê bidime we, hûn bên ber otobosê. Paşê min xwest ez xapexap bi ser Xezalê va bigrim.

Zeynebê ew bire malê. Wê dixwest ku Xezalê zû bê malê. Ew li xebatê bû. Zeynebê nizanîbû ji şabûnê çi bikira. Wê Sêvê da rûniştandin, hahaka av anî; mêvanê serûçavê xwe şûşt. Paşê sifre danî ber. Sêvê xwarin hindik xwar lê tasa qatix kişande ber xwe. Zeynebê pez dot û berda, paşê dest pê kir ku şîr li sêbêratorê bixe.

XI

Sêvê kir, ku ew destûra wê bide da alîkariya wê bike.

Zeynebê xatirê wê neşikand, Sêvê dest pê kir milê sêberatorê bada. Gava toxavik ji şîr veqetiya, di aliyekî da hat û şîrê binî jî di aliyê din da. Sêvê nolî zaroyeka çav bi xişmişkên bedew bikeve û

firnax be timakar lê dinihêrî. Ew hata berêvarê deqeyekê rûnenişt, li ber destên Zeynebê diçû dihat.
Dema êvarê Xezal vegeriya malê, Sêvê xwe veşart û ji Zeynebê hêvî kir, ku tiştekî nebêje. Xezal hat serçavê xwe şûşt, rûnişt. Diya wê xwarin anî, danî ber. Xezalê got:
- Dayê, nameyên Sêvê ji min ra nehatine?
Zeynebê li wê nihêrî, texmîn kir ku ê qîza wê çiqas şa be ku bêje "Belê nameyên wê hatine", lê xwe zeft kir, got:
- Xezal qîza min, ku bihatana min ê pêrapêra bida te. Xezalê serê xwe kir ber xwe, got:
- Ax, gelo çima ev ewqas wext e ew nemeyan naşîne, yan jî nayê? Ha dayê, hebe tunebe tiştek li serê Sêvê qewimî ye, yan na ew ê tu caran wê bersiva nameya min ewqas dereng nedixist.
Wî çaxî bû pirqîna Sêvê û ji pişt derî derket. Xezalê demekê li wê nihêrî û ji çavên xwe bawer nekir; çavên xwe mizdan, girt, vekir, dît dîsan Sêvê li ber wê sekinî ye û jê re dikene. Hingê ew ji ciyê xwe rabû, hevala xwe hemêz kir, ramûsa, te ê bigota ev deh sal in wê nedîtiye. Paşê herdu heval li kêlaka hevdu rûniştin. Xezalê dest bi pirs û pirsyaran kir. Di derheqa heval û hogirên xwe da, di derheqa mala wan da pirsî. Sêvê jî pirs jê dikirin û awa heta nîvê şevê ew wisan li bal hev rûniştin û xeberdan.
Xezalê ciyê xwe û yê Sêvê di odeya jorîn da danî. Gava gişk razan, Sêvê bi nermî di derheqa Ahmo da gote Xezalê, ku ew ji bo Xezalê dîn dibe. Wê got, ku di pey çûyîna Xezalê ra rojtira mayin ew jî çûye. Zaf melûl û dilşikestî bûye. Xezalê dengê xwe nedikir, wê kerr û lal guhdarî dikir û di dilê xwe da şa dibû, ku Sêvê xwe
zz

bi xwe di derheqa Ahmo da serê giliyan vekir. Wê dixwest, ku Sêvê dîsan xeberde lê Sêvê xebera xwe guhast, got:
- Xezal, rast bêje dilê te bi Ahmo va heye? Min zû da texmîn kiribû, lê culet nedikir, ku ji te pirs bikim. Xezalê bawer nedikir, ku Sêvê pirseka wisan jê bike, lê wextê hatibû pirskirin divyabû ku bersivê bide, got:
- Sêvê, ez hê nizanim, ka ji Ahmo hes dikim yan na lê ez ji tu kesekî mayin hes nakim; ew kurekî baş e.
Wê di derheqa Qaçax da hinek şor kir. Ji Sêvê ra got, ku ji hinga ew ji Erêvanê hatiye, ew bi şev û ro terka wê nake; diçe û tê, dixwaze xeberde, lê ew nahêle. Wê di derheqa Karê da jî ya ku ew du roj bûn anîbûn zeyî, şor kir. Bi vî awayî hete berbangê xeberdan. Berbangê, herdu jî di xew ra çûn. Xezal şeveqê rabû, çû serçavê xwe şûşt, gava hat dîna xwe dayê wa Sêvê jî rabûye û ciyan rast dike. Wê kir nekir nikaribû ji dest bigirta, Sêvê nivîn rast kirin. Xezalê jî der û sivder paqij kirin û herdu heval çûne avê. Wextê Sêvê derkete derva bîna cinetê ji mêrg û deştan dihat. Wê ew bîna xweş dikişand, li dorberê xwe dinihêrî û li wê bedewiya tebîetê şaş ma. Li wan çiya û baniyan, li wan gul û sosinên deştê, yên ku rengareng ji dûr va dihatine xuyakirin şaş ma, kêfxweş bû. Li ser kaniyeka sar, Sêvê serûçavê xwe şûşt û paşê vegeriyane malê. Heta ew hatin Zeynebê êdî teştê hazir kiribû. Hêkerûn ji wan ra çêkiribû, toyê qatix, hingiv, feraqek jî toxavka teze danîbû ser sifrê. Herdu hevalan taştiya xwe xwarin û bi tevayî, bi eşq û şa çûne deştê.
Xezalê, Sêvê bi xebatkaran da naskirin. Ew bir li nav zeviyan gerand. Sêvê dît ku gişk dixebitin, lê ew naxebite, li wan dinhêre. Wê îdare nekir, ji Xezalê lava kir, ku bi tevayî bixebitin. Wê berê

nizanîbû tirmix bikira. Tirmix li vî alî, li wî alî liba dikir; li lingên xwe dixist. Gîha nedikete ber tirmixa wê. Lê heta nîvro ew rind
Z3

hê bû.
Bi wî teherî, êdî Sêvê lingên xwe ji deştê nebirî bi Xezalê ra dihate xebatê û bi wê ra vedigeriya malê. Piştî xebatê jî yan ew diçûne bal Karê yan jî Karê dihate bal wan û heta derengî sibê ji xwe ra xeber didan. Karê xweziya xwe bi Xezalê û Sêvê dianî. Wê giliyê mêrê xwe, yê mala xwe ji wan ra dikir, digot:
- Xezal can, tu nizanî bavê min çi anî serê min? Ma min ew xort nas dikir, qet di xewnên şevan da jî ew nedîtibû. Paşê bila yekî pak bûya, bila min bizanîba? Kul ew kul e, qet nizane ez heme yan tune me! Ez nizanim bi ku da herim, çi xweliyê li serê xwe bikim; wî bihêlim û bêm, nabe. Ez ji navê xwe şerm dikim, ê sibê bikin şerm û bidin ruyê min, nehêlim neyêm jî ez ê li wir ji dest herim. Ez awa ketime orta du keviran, nizanim bi kîjan aliyî da herim?
Karê derdê xwe digot û pê ra jî digirya. Çavên Xezalê û yên Sêvê jî tijî hêsir bûn.
Êvarekê dereng Sêvê û Xezal ji mala bavê Karê diçûne malê, bi rê va rastî Qaçax hatin. Wan êvarxêrî di wî dan û xwestin derbas bibin, lê ew li pêşberî wan sekinî û gote Xezalê:
- Xezal, tu çima wisan bêînsaf î? îşev çend şev in ez li benda te me, ka te çawan bibînim û derdê xwe ji te ra şirove kim. Ma qet Xwedayê te tune, tu nabînî ez ji bo evîna te eşqê li serê min xistiye? Ez dîn û har bûme, lê tu qet naxwazî ji min ra du xeberan bêjî û dilê min rehet bikî. Xezal, ruhê min jiyana min di destê te da ye,

tu bixwazî tu ê min bikujî, tu bixwazî tu ê min bihêlî. Serê min bi min va nîn e, ez nizanim şev û rojên min çawan derbas dibin, ez li ber çi me. Halê min dê çawan be, bêje, horiya min? Roniya çavên min, bêje, ez bi ku da herim?

Xezalê nizanîbû çi bike, çawan rê bibîne û ji destên wî xelas bibe, got:

24

- Qaçax, şerm e, nîvê vê şevê ye, te ji bo çi riya me girtiye û nahêlî em herin? Şerm e, gundiyek niha rastî me bê yan jî bavê min me bibîne, dê çi bêjin? Tiştên te niha got, min deh caran bihîstiye û min bersiva te jî daye. Êdî çima tu hertim dibêjî? Min ji te ra gotiye û careke mayin jî dibêjim: Ez niha tu carî mêr nakim, heta ez xwendina xwe kuta nekim, mêr nakim. Paşê eger mêr bikim jî gereke mêrê min bi gotina min be, bi dilê min be, yekî ku ez bixwazim, yekî ku hesiyeta wî mîna ya min be. Lê ez û tu... Qaçax, em tu caran nikarin bi hev ra di eynî riyê de herin. De dereng e û bela xwe ji min veke!

Ev gotinên Xezalê mîna tîrekê navdilê Qaçax hingavtin, ling lê lerizîn, ber çavên wî reş bû, bû duman. Mîna merivê serxweş şewişî û cî bi cî rûnişt. Serê xwe kire orta herdu destên xwe û kerr bû. Xezal û Sêvê xatir jê xwestin û bi lez çûn.

Roj dihatin û derbaz dibûn. Kesekî tê dernexist çawan tên û debas dibin lew herkes bi karê xwe va girêdayî bû. Sêvê û Xezalê tê dernedixistin ka roj çawan derbas dibin. Sêvê hatibû ku tenê pênc-şeş rojan bimîne, lê êdî panzdeh rojên wê bûn ku ew hê neçûbû. Ew ê hê jî bima, heke diya wê jê re li têlê nexista. Lê dê û bavê Xezalê qet nedixwestin ku ew here, wan bi qasî Xezalê ji Sêvê jî hes dikir. Sibetirê Sêvê bi rê kirin. Sê roj di ser çûyina Sêvê re derbas nebûbû, Xezalê ji Sêvê û ji Ahmo name stendin. Ew gelek

şa bû.
Êvarê gava Xezal hate malê, pêrepêre rûnişt, ji Sêvê û ji Ahmo ra name nivîsî. Wê nivîsandina nameyan kuta kiribû, Karê hat. Karê herdu name dîtin, pirs kir, ku Xezalê ji kê ra nivîsiye. Pêşî Xezal sor bû paşê nîşanî wê da û got, ku yek ya Sêvê ye ya din jî ya hevalê wê ye; ji kursa wan. Karê li Xezalê nihêrî, keniya û got:
- Erê, delala dilê min, te ji min re tu tişt negotiye, hevalê te ye, lê ku wisan e tu çira wisan sor bûyî? Xezal bêhtir sor bû. Karê he-
*5

mêz kir û maçî kir, got:
- Karê, tu dizanî ez tiştekî ji te venaşêrim. Di orta min û Ahmo da tiştek tune. Ez wî diecibînim. Xortekî zaf baş e, lê nizam paşê ê çawan bibe. Tev ev e, çi tê de heye, ku tu wisan li min dinihêrî? Tu dibêjî qey min gunehkarî kiriye. Wan pirr xeberda, paşê Xezalê, Karê bi rê kir û hate malê.
Ji çûyîna Sêvê gelek wext derbas bûbû, lê Xezalê nameyek tenê ji wê sitendibû. Ew çawan bihata malê pêrepêre ji diya xwe dipirsî, lê bi tirs bû: Mîna ku bêje:"Dibe îro bêje na, tunene". Te ê bigota qey Zeynebê niyeta qîza xwe fêm kir û gotê:
- Nameyek
ra hatiye, qîza min. Tu çira ditirsî? Niha rûne,
ji te
nanê xwe bixwe, ez ê ji otaxa din bînim.
Xezal bi van xeberên diya xwe kêfxweş bû. Ew li hêviya diya xwe nesekinî, ber bi oda din çû, name hilda û lê nihêrî. Ew destnivîsara Sêvê bû. Wê hahaka vekir û xwend. Sêvê nivîsî bû
"Selam Xezal can, bibexşîne ku xerab û kurt dinivîsim. Xuşka

min a şêrîn, min gelekî bêriya te kiriye. Zû were, êdî wextê xwendina me hindik maye. Ahmo di nexweşxanê da ye û gelek xedar e. Dîsan dibêjim heke dikarîzû were. Ji ber min va li diya xwe, li bavê xwe û li heval û hogirên xwe li gişkan silav bikel".
Sêvê
Xezalê xwend û hêsir ji çavên wê barîn, di wê saetê da çavên wê tiştek nedidîtin. Wê dixwest hema here, zû here bal Ahmoyê xwe. Lê nikarbû. Diviyabû ku ji diya xwe ra bigota lazim e du rojên din şûnda here.
Ew herdu roj ji bo Xezalê bûne sal, xewê şevan lê bûbûne hesret; tiştek nedixwar ne jî vedixwar, nikarîbû karek bikira. Deng jê biriyabû. Wexta diya wê jê dipirsî çi qewimiye, digot:
- Tiştek tune, anê can!
Piştî du rojan Xezal ji gund derket. Berêvarê saet şeş bû, wextê
26

Xezal gihişte Erêvanê. Ew ji otobosê peya bû û rast çû mala Sêvê. Wextê ew gihişte wir tirpetirpa dilê wê bû. Li zengil xist, diya Sêvê Şûşanê jê ra derî vekir. Gava ku wê Xezal dît, pirr şabû, ew hemêz kir, got:
- Tu di ser çavên min ra hatî, Xezal can! Kerem bike hundir, kerem bike, qîza min a delal! Me bêriya te kiribû. Sêvê herroj di derheqa te da xeberdida, lê van rojên dawîn rojên hatina te hesab dikir. Lê te bihîstiye, ku Ahmo ji gund anîne vira, kirine nexweşxanê? Dibên gelek xedar e. Sêvê rojê deh caran diçe balê, xwarinê dibe, lê tim melûl vedigere. Carina jî digirî û dibêje: "Pirr diêşe". Xezalê êdî xwe wenda kir, bi destên xwe çavên xwe girtin û îske îsk pê ket te dê bigota her xebereke Şûşanê kulek dikire dilê wê.

Wextê ew hinekî aş bû got:
- Xatiya Şûşan, tu nizanî ew di kîjan nexweşxaneyê da ye û nexweşiya wî çi ye?
Şûşanê got:
- Sêvê digot: "Ew ji Erêvanê çûye gund û otobosa ku pê çûne bi rê va wergeriyaye, lê Ahmo baş xelas bûye". Dibêjin: "Zaf ji serê xwe digazine". Xezalê got:
- Xatiya Şûşan, bila hûrûmûrên min
vir bimînin, ez ê herim
li
binihêrim ka dikarim Ahmo bibînim yan na. Bi texmîna min Sêvê jî li wir e, em ê bi tevayî bêne malê.
Xezal bi lez çû nexweşxanê. Sêvê, Anûşavan û çend merivên ne-nas, ku kincên kurdî
wan bûn, rûniştî bûn. Sêvê ew dît, ber bi
li
wê çû û xwe avîte pêsîra wê, got:
- Xezal can, çi baş e ku tu hatî, îro çend rojin çavên me li riya te qerimîn. Me bawer nedikir ku tu ê îro jî werî. Anûşavan hat selam da wê lê Xezal sar bûbû, nikarbû xeberda, got:
27

- Zaf xedar e. Nahêlin em wî bibînin. Me ewqas lava kir, nehiş-tin. Tişt nabe du roj mane em ê bêne piraktîkê û hingê em ê wî bi-bînin. Ev jî diya Ahmo, bavê wî û birê wî ne. Xezal sor bû, serê xwe kir ber xwe, nêzîkî wan bû, selam da wana. Diya Ahmo Xe-zal hemêz kir, kelogirî gotê:
- Qîza min Xezal tu yî? Ahmoyê min çiqas di derheqa te da şor

dikir, çiqas pesnê te dida. Wextê nameyên te dereng dihatin, niza-
nîbû çi bikira, lê roja wî distend ji şabûna lingên wî erd nedigirtin.
Çavên Xezalê jî tijî hêsir bûn û ew jî giriya. Sêvê bi wan ra şer
kir, got:
- We xêr e, hûn çima digirîn? Ahmo van rojan baş dibe û tê
dersê.
Ew li wir gelek rûniştin. Lê dîna xwe danê destûra wan nadin,
ku herne hundir bal Ahmo, çûne malê.
îlonê bû, Xezal û Sêvê diçûne dersê. Wan qerar dabû ku
Yekê
ew ese Ahmo bibînin, wisan jî kirin. Piştî dersê çûne bal rektorê
xwe, kaxez jê hildan, ku bihêlin ew piratisyen herne nexweşxanê.
Pirs kirin ka Ahmo di kîjan odeyê da ye, çûne wir. Ahmo di nav
ciyan da bû, çavên wî girtî bûn, serê wî girêdayî bû û di nav germê
da disincirî. Wextê Xezalê ew dît çokên wê sist bûn, nêzîkî textê
razanê bû, bi destê Ahmo girt, got:
- Ahmo can selam, tu çawan î? Wê bi dilovanî pirsî.
Ahmo çavên xwe vekirin. Te dê bigota qey wî di xewna xwe da
Xezal û Sêvê dîtiye û bi wan ra keniya; destê Xezalê yê nerm gi-
vaşt û careke din çavên xwe girtin. Xezalê êdî nikarbû xeber bida,
hêsirên wê nolî taviyên baranê ji jorda dihatin. Sêvê got:
- Ahmo can, bêje tu çawan î, tu îro hinek baş î?
Wî serê xwe hejand, dixwest bigota, ku ew hinek baştir e. Wî
28

nikaribû xeberda, iê bi destan dida fêmkirin. Xezal û Sêvê çûn,
germpîvok anîn, germa wî pîvan sî û neh derece bû. Dereceyek ji
ya herroj kêmtir bû. Ew şa bûn û gotne Ahmo:

- Ahmo can, îro germahiya te jî hinekî kêm bûye. Şikir çend ro-
jên din şûnda tu dê bêyî dersê. Tu di derheqa dersan da nefikire.
Em ê dersên te jî hazir bikin.
awayî, roj bi roj Ahmo ber bi başbûnê va diçû.
Bi vî
Xezal û Sêvê timî diçûne balê. Rojekê, Xezalê gote Sêvê ku piştî
dersan herin kulîlkan bikirin û herne bal Ahmo. Lê Sêvê got ku
ew nikare. Diviyabû ku ew piştî dersan bi diya xwe re biçûya ma-
la xwûşka xwe. Xezalê qirar girt ku tenê here. Piştî dersan çû gu-
lin kirîn û çû bal Ahmo. Vê carê êdî Ahmo baş bû. Wî xelat veki-
ribû û di nav cîh da rûniştibû; qelema wî di dest da, dinvîsî. Wî
kêlekê rûnişt. Bala xwe dayê ku ew
Xezal nedît. Xezal çû hêdîka
li
şiêrekî dinivîse. Wê bi ken got:
- Ahmo, tu bûyî şayîr? Erê tu naxwezî qet li vî alî jî binêrî?
Ahmo ku Xezalê dît, sar bû. Wî ji çavên xwe bawer nekir, paşê
got:
- Xezal, bibexşîne min te nedît û zû zû şiêra xwe hilda.
Xezalê got:
- Tişt nabe,
Tu çima vê şêirê
lê te çima şiêra xwe zû revand?
ji
min vedişêrî?
Ahmo sar bû, êdî bêbersiv bû, nikaribû tiştek bikira. Şiêr derxist
û da wê, got:
- Ha..., bixwîne! Tiştek tê da tune! Ez vala bûm min xwest

ji
wî girt û xwend. Wî di derheqa
xwe ra binivîsim. Xezalê
ji destê
qîzekê da nivîsîbû. Di derheqa qîzeka ku ew ji wê hes dike, lê qîz nake da bû. Xezalê xwend, keniya û da wî.
ji wî hes
29

Xezalê got:
- Ma te ji bona vê yekê ji min şerm dikir?
Ahmo got:
-Xezal... erê... Tu rast dibêjî. Ez ji qîzekê hes dikim hem jî wisan hes dikim, ku tu kesî hetanî niha ji kesî hes nekiriye.
Xezalê got:
-Erê zaf baş e, lê tu ji kî hes dikî, ango kî ji te hes nake. Tu ew-qas melûl î û di derheqa vê yekê da helbestan dinivîsî? Bêje, dibe ku ez ji te ra çarekê bibînim?
Ahmo serê xwe kir ber xwe û got:
-Erê Xezal... hema tu yî! Heke dikarî dilê min î birîndar der-man bikî, bike! Tu çi bixwazî tu ê bikî, tu bixwezî tu ê min bikujî, tu bixwazî tu ê min sax bikî.
Te dê bigota qey Ahmo ev xeberdana han ji bêhişî got. Ew bê hemdî xwe diaxivî. Wextê Xextê ev axaftin bihîst te ê bigota teze rih hate laşê wê. Gava Xezalê ev xeberdan bihîst, te dê bigota qey rihekî teze hatê. Li Ahmo nihêrî û ji şerma serê xwe kire ber xwe ûgot:
- Ahmo, tu çi dibêjî? Ez çawan dikarim te bikujim, ne ku ez te

bikujim ez ê jî bimirim? Lew tu jî hekîmê dilê min î!
Ahmo ji şabûna nizanibû çi bikira. Bi destê wê girt, got:
-Xezal, dinyayeke teze ji min ra vebû.
Xezalê êdî şerm kir, rabû, lê niherî, xatir jê xwest û çû.
Piştî çendeyekî Ahmo ji nexweşxanê derket, lê hê baş bi ser xwe va nehatibû. Doktoran ew çendeyekî ji dersan azad kirin û çû gund. Ew piştî maweyekê hate dersên xwe.
Evîn û heskirina Xezalê û Ahmo roj bi roj pirrtir dibû, ew bêî hev nediçûne tu cîhekî, bêî hevdu tiştek nedixwarin. Tevayî diçûne kitêbxanê, ders dixwendin û tevayî dihatin.
Di înstîtûyê da pesnê wan dihat dayin; di derheqa dersên wan
30

da, di derheqa aqil û kemala wan da xeber didan. Pênc sal bi vî awayî derbas bûn. Pênc salên evînî û yên xwendekariyê, salên şêrin...
Ev herdu ciwan di kursa şeşan da bûn. Ew bi tevayî ji bona îmtîhanên dewletê hazir dibûn.
Rojên Gulanê yên xweş in, deşt û zozan, bax û bostan tev kemilîne. Hergav, sibê şeveqê Xezal û Ahmo kitêbêd xwe hiltînin û diçin nava baxê li ser navê şoreşgêrê eyan Gûkasyan û xwe ji bo îmtîhanan hazir dikirin. Paşê car-caran wextê ku vala dibûn di derheqa jiyana xwe ya pêş da diaxivîn; difikirîn ka ê çawan ji xwe ra malê daynin, ji xwe ra hûrûmûrên navmalê bikirin û bi dilê xwe tiştên xwe di nav malê da bi cîh bikin. Carina jî piştî xwendina kitêb û ferhengên xwe vedikirin û ji hev pirsan dikirin. Bi vî teherî rojên berî îmtîhanan derbas dibûn.
Edî roja îmtîhana dewletê ya pêşîn bû. Wê rojê, wek Xezal û

Ahmo wisan jî xwendekarên mayîn di cîhê xwe da qet rehet nedi-
sekinîn ango diçûn û dihatin. Bi bêdengî û bêhisî di qesra enstîtu-
yê da rûniştî bûn û dibihîstin çika hevalên wan çawan îmtîhan di-
bin.
Wê rojê Ahmo û Xezalê îmtîhanên xwe bi qîmetên zaf rind dan.
Wan îmtîhana xwe ya mayin jî pirr xweş da.
Ji şabûna lingên wan erd nedigirtin. Şa dibûn, lew bi serfîrazî
enstîtuyê xelas kiribûn. Tayina Xezalê ya doktoriyê dabûn nex-
weşxaneya gundê Elegezê. Lê ya Ahmo dabûn Artaşatê.
Xatir ji hev xwest in, şiklên xwe dane hev û ji hev qetiyan. Lew
wesayitên wan êdî bi rê diket. Ahmo nedixwest destê Xezalê ber-
de. Wî li nav çavên wê dinhêrî û mîna zaroyekî ku dixweze bigirî
lêva xwe daliqandibû.
Xezal jî ne di halekî baş da bû. Wê jî çav û birûyên xwe tevîhev
kiribû, nikaribû li Ahmo binhêriya. Ditirsiya ku bigirî. Ahmo bi
3i

dilekî birîndar ji otobosê peyabû û otobos bi rê ket.
Xezal gihîşte malê, hîn roj li nîvro bû. Zeyneb tenê li malê bû.
Gava wê Xezal dît, dinya lê ron bû. Mîna qîzeke çardeh salî li ber
qîza xwe reqisî, ew hemêz kir; ramûsa û got:
- Şikir, şikir ji vê rojê ra! Qîza min ya şêrîn, te bi serfîrazî
xwendina xwe kuta kir û doktor vegeriyayî malê. Ev ji min ra hê-
jaye malê dinê. Ez îro gihîştime mirazê xwe, meramê min hate cîh.
Şikir ji vê gavê ra. Lê Xezal, te negot tu dê li kuderê bixebitî?
Gava dê pê hesiya ku ew ê li gund bixebite, şa bû. Qîza wê dibû
doktora gund? Çi keremeke mezin e! Di wê demê da bavê Xezalê
bi cînarên wan va hatin. Bavê wê ji diya wê zaftir şa bû. Wê şevê

ew heta berbangê ranezan. Dê û bavê wê li kêleka qîza xwe rûniştin, pirs û pirsyar jê kirin. Heftek jî derbas nebû Xezalê bû doktorê gundê Elegezê.
Di nav mala Hemîd da şîn û girîn bû. Kurê wan yê biçûk Erfût, bêhal bû. Qirik û gewrî li wî tijî bûbûn û nikarîbû xeberda. Qnarek diçû, yek dihat. Gişkan digot "Ew ê bimire!".
Êvarê, gava Xezal hate malê, diya wê di derheqa Erhût da pê ra qise kir û got ku diya wî naxweze gazî doktor bike, ew dibêje "Doktor ê kurê min biavêjne bin kêrê".
Xezalê êdî xwarin nexwar, xebera diya xwe di nêvî da hişt, derman û derziya xwe hilda, di derî va derket. Diya wê jî da pey. Lê mala Hemîd dûrî mala wan- nebû, zûtirkê gihîştine wir. Gava Xezalê derî vekir, dît ku hewa zaf giran e. Cîhê ku nexweş paldabû tijî bûbûn, lûbe-lûba wan bû. Diya nexweş li ber serê wî rûniştibû, dilûrand. Yên din jî digiriyan. Şêxa gund Werda li kêleka diya nexweş rûniştibû. Wê jî qewl û ayet digot û bi diya nexweş ra şer dikir; ku neke qajîn û gede duruh neke. Gava Xezalê ev yek dît, hew îdare kir. Ew nêzîkî nexweş bû, hilke hilka wî bû. Xezalê destê wî girt, germahiya laşê wî pîva. Paşê derzî hazir kir, ku derziye-
32

kê lê bixe. Şêx Werda ku hîn qewla xwe temam nekiribû, kire qajîn:
- Wîîî... Xwedê, gunehên min zaf in, ev qîzik çi dike? Çi
ji vî ti-
falî dixwaze? Gede dê biherimîne, bi van derziyên xwe yên heram! Gedê cinetî dê biherimîne... Sînem te porê xwe kur kirê! Tu çi sekiniyî û lê dinhêrî, kûrbûyê li ber çavên te dergûşa te diherimînin!

Gede va can dide, bi ruhsitînê xwe ra şer dike, ew jî hatiye wî di-
herimîne! Xwedê... tu kevir û kuçan bi serên me da bibarînî! Zul-
ma weha jî dibe? Li min gunehkarê?
Werdê xeberdana xwe didomand, Xezalê derzî hazir kir, der-
man kişandê û nêzîkî gede bû. Di wê demê de Sînemê kire qijîn,
xwe avîte ser gede, got:
- Haho...! Tiştekî wa nebûye, ez nahêlim hûn kurê min derzî bi-
kin.
Xezalê bi lava, bi qurban, bi heyran ancax Sînem serwext kir û
wê bi dilekî kul hişt. Şêx Werda, gava ew yek dît, erinî û xwast
here, lê Sînem li ber sekinî, jê lava kir, got:
- Dayikê, ez xweliya bin lingên te me! Min gunekarê çi kiriye,
çira diçî? Bisekine, min tenê nehêle!
Lê Werdê guh neda wê, derî vekir û got:
- Êdî lingên min bi vê malê nakeve! Tu bêaqbet bimirî! Sînem,
tu bi devê kûçikan herî! Tu dê li wê dinê di nava qîr û qetranê da
biqicqicî! Tu bûyî sebebê ewladê xwe. Bi çêr û pêçarî derî girt û
çû.
Gava Şêx Werda çû, çend jinên navsere jî dane pey wê û derke-
tin, çûn. Di malê da Xezal, Zeynebê, kulfetê mala Hemîd û çend
kulfetên mayin mabûn. Xezal heta sibê li ber lawik rûnişt. Derzî li
ser derziyê lê xist. Kompris kir, bi zorê devê wî vekir, derman da-
yê. Serê sibê şeveqê ji cînaran tirê Erfût êdî mirye, lê na. Erfûtî sax
bûbû. Rojtira mayin Xezalê ew guhaste nexweşxaneya gund.
33

Erfût deh rojan di nexweşxaneyê da ma û sax bû. Wê çaxê êdî
navê Xezalê wek doktoreka baş di nav gund da bela bû. Dê û ba-

vê Erfût nizanîbûn çi bikirina, ku ji bin qenciya Xezalê derkevin. Di muayenexana ku Xezal tê da dixebitî da gelek nexweş hebûn. Ew bi dor diçûne bal û bi eşq û şayî derdiketin. Te dê bigota ew nexweş di nav çend deqeyan da sax dibûn. Wextê ku nexweş derdiketin, herkesî ji hindava xwe va pesnê Xezalê dida.

Di wê demê da derê doktorxanê vebû, xortekî bejinbilind û çavreş ji derda hat. Selam da gişkan û rûnişt. Wî kesekî nas nedikir û ji aliyê tu kesekî ve jî nedihate naskirin. Qet xeber nedida, lê dibihîst ku xelk di derheqa Xezalê da çi dibêje. Wî qelûn li ser qelûnê dikişand û li derî dinhêrî, pirtepirta dilê wî bû. Wî bawer nedikir ê Xezala xwe ya bi evîn bibîne û pê ra xeberde. Kî ku ji bal Xezalê derdiket, wî xweziya xwe bi çavên wan dianî, dikir rabe here bal, lê şerm dikir û nedixwest xebata Xezalê bisekinîne. Lê êdî sebir nekir, rabû hinek li piya sekinî careke mayin rûnişt. Dilê wî qaîm lêdixist, rûyê wî sor dibûn. Jinek ji hundir derket û xort çû hundir. Xezal xeftanê çilqerqaşî lê, li ber masê rûniştî bû, bi lez dinvîsî. Wê serê xwe ji ber xwe dernexist.

Gava xort derî nerm vekir û ket hundir, sar bû. Li ber derî sekinî, nikarîbû tiştek bigota. Ji çavên xwe bawar nedikir. Gelo ya ku li ber masê rûniştî bû, Xezal bû yan jî wî xewn didît?

Paşê wî hêdîka navê Xezalê hilda. Xezalê ku navê xwe bihîst, serê xwe hilda û li wî nihêrî. Gava ku wê xort dît, weka ku ji jor ve bi ser serê wê ve risasê birijînin heta binê lingan. Ew ji cî heliqî, lê xwe zeft kir. Wê ji bawar nedikir, herdu destên xwe danî ser çavên xwe, lê hingê ew xort nêzîkî wê bû, herdu destên wê ji ser çavên wê hildan û ew ramûsa, got:

-Delalya min, gula ber bîna min, Xezala min tu bawar nakî? Ez im, binihêre, netirse, xewn nîn e, rast e, şêrîna min!

Dema Xezalê van gotinan bihîst, kire îskîn û li wî nihêrî, got:
- Ahmo, tu çawan hatî? Te qet ji min ra van rojan name jî nedi-
şand. Ez zaf difikirîm. Min digot, dibe tu bêkêf bî, lê baş e, şikir
tu sax û silamet î û va li bal min î.
Ahmo bi ken jê ra got, ku ji qestî jê ra name neşandiye, lew
xwestiye bi xapexap here, da ew nizanîbe. Paşê wî got, ku dê û
bavê wî jî hatine, li mala bavê Xezalê ne.
Xezalê ji kêfa nizanîbû çi bikira. Ahmo li wê dinihêrî, wê jî li
wî... Ew wisan qederekî kerr û lal sekinîn. Te dê bigota dixwazin
heyfa xwe ya çendeyekî hildin. Lê na, herçiqas li hev dinihêrîn jî, ji
hevdû têr nedibûn.
Ahmo bala xwe dayê ku nexweş derî vedikin û digirin, gote Xe-
zalê:
- De bi xatirê te, ez ê herim malê û bêsebir çavnihêriya te bikim.
Xezalê ew heta ber derî bi rê kir û jê pirsî gelo ê dê û bavê wî
tiştekî nebêjin, lew ew servekirî bû. Ahmo keniya û gote Xezalê:
- Xezal, şerm e, gotinên wisan nebêje. Dê û bavê min ewqas jî
paşdamayî nîn in.
Ahmo, dê û bavê wî du rojan li Elegezê man. Wan hema roja
pêşîn Xezal nîşan kiribû û rojtira dinê dixwestin vegeriyana malê,
lê mala bavê Xezalê nehiştin. Wan rûmeteke mezin ji wan ra girt.
Paşê, rojtira mayîn ew bi rê kirin.
Dê û bavê Ahmo dixwestin çend mehên din şûnda Xezal bibira-
na. Ew pevketin, heta havînê piştî gihadirûnê.
Ahmo zaf bêsebir li hêviya hatina havînê bû, lê wisan zû wext
derbas bû, ku ew jî zendegirtî ma. Mala wan êdî karê dewetê di-

kir. Wan êdî xwençeyên xwe digerandin, kar û tedarekê vexwendiyan didîtin. Mala bavê Xezalê jî, ji wan şûnda nedima. Xezal û bavê wê çend rojan çûne Erêvanê. Ji bona cihêz çi ji wan re lazim bû, kirîn û vegeriyane malê. Gava Xezal û Mecîd hatin, çend cîna-
35

rên wan di malda bûn, dîtin, ku çiqas hûrûmûr, kinc, rihel ji Xezalê ra kirîne. Cînar zendegirtî, şaş bûn. Surmê, cînara wan di cîh da nêzîkî wan bû, got:
- Ê..., Mecîd birê min, tu dibêjî, ku te qelen nestendiye, lê çima te ewqas tişt kiriye? Ez bi serê kurê we kim, birê Mecîd, tu zulmê dikî! Meriv rabe qîzê bê qelen bide xelkê û di serda jî malekê pê ra dayne? Na, qurban tu carî wisan nabe. Tu bi vî awayî bi hurmeta qîza xwe dileyizî, tu qîza xwe sivik dikî. Qîza bê qelen bê rûmet e, birê min! Tu çawan ji Xwedê natirsî û qîzeke nolî Xezalê bê qelen didî? Tu were guh bide xuşka xwe, ez ji te ra bêjim. Ev gilî, giliyê bav û kalên me ye: "Carekê, yekî qîzeke bê qelen xwest. Wextê qîzê siyar dikin, dibin; bi rê va dixwazin ji çemekî derbas bibin. Bûk li ser hespê bûye, av lê dixe û hindik dimîne li ber pêlan here, di wê demê da meriv digihîjinê, ku xelas bikin, lê xezûrê wê dike gazî, dibê: "Hespê min xelas bikin! Hespê min...cehnima bûkê, ew bê pere ye !". Gava bûk van gotinan seh dike, kerr û lal vedigere mala bavê xwe û dibêje: "Ez bê qelen ew naçim!" Gava qelen tînin û bûka xwe dîsan dibin, xezûrê wê ew terk nake, timî hay jê dimîne. Wextê digihîjine çem xezûr dike gazî: "Wî... gidîno, ez ketime bextê we li bûka min miqate bin". Aha birê min, bûka bê pere, bê rûmet e jî...
Gava Mecîd ev gotin bihîstin, pirr aciz bû, hêrs hatinê, lê xwe

zeft kir û got:
- Xuşkê, ew zeman êdî çûn, zemanê qelenê qilêrî çû, ez niha tu carî nikarim qîza xwe bi qelen bidim. Li gor gotinên te gereke min Xezalê bi peretî bida, paşê jê re cihêz bikiriya? Min ê bi çi dilî hebûna wê mala ku qîza min ê herê talan bikira? Min ê qîza xwe bişanda ser maleke req û rût? Paşê ez ê bi çi rûyî biçûma mala wê, min ê çawan li mêrê wê binhêriya? Ez ê bi çi rûyê li qîza xwe binhêrim? Ma ev qîz dê nebêje, gelo ev bav bû yan tucarê merivan
36

bû, mala mêrê min talan kir û ez paşê dame wî. Na, xuşka Surmê, bi texmîna min, min zaf baş kriye, bila li hev pîroz û mubarek bin. Bila herdu ji hev ra baş bin, ew ji min ra hêjaye malê dinê.
Çend cînar bi gotinên Mecîd razî bûn. Lê Xezal rûniştibû, bêdeng li wan guhdarî dikir.
Rojeke havînê yî xweş bû, ber derê mala bavê Xezalê tijî bibûn. Qîz û xort ketibûne govendê û bi deng dilîstin. Gund û gundî li hêvîya mala zavê bûn, li hêvîya vexwendiyan. Dê û bavê Xezalê jî ketibûne boçikê û dilîstin. Lê Xezal û Karê di mal da li rex hev rûniştibûn. Şêrîn, şêrîn bi hev ra xeber didan. Hev hemêz kiribûn û rûniştibûn. Di wê demê de, ji derva deng gihişte hundur, "hatin". Xezal û Karê rabûn. Wan wê şevê tenê li hev dinehêrî. Xezal sor bûbû, bi ser sûretê hinarîn da hêsir dibarîn, lê Karê henek kirin û bezî derva, ku rastiyê hîn be. Gava ew derkete derva, bala xwe dayê hewş bi gundiyan kimkimî bû. Te derzî biavîta nedikete erdê. Karê ancax ji nav wan derket û sekinî. Dixwest riya Êrêvanê bihata kivşê. Wê nihêrî û dilê wê avît, çend otobosan nêzîkayî li gund dikirin. Ji dûr va dengê def, zirne û kilaman dihat. Karê dîna

xwe da otobosan û texmîn nekir, ku merivek bi lez û bez di ber wê ra derbas bû.
Wê ji pişt xwe va dengê ken û qerebalixiyê seh kir û ber bi malê ve çû. Gava ew gihişte malê ecêbmayî ma. Çend xort û qîz di dora xortekî de diçûn û dihatin, wan dixwest avê bi serda bikin, lê wî xwe danetanî; wek "rûvî" bû. Ew hevalê Xezalê û Ahmo Kolya bû. Di wê demê da Xezal derketibû derve. Gava wê Kolya dît, ber bi wî çû, selam dayê û ew bire malê, lê pişt û serçavê wî di avê da mabûn. Karê jî di pey wan de çû malê. Xezalê ew bi Kolya da nas-kirin û ji bo ku Kölya kincên xwe biguhêze Xezal û Karê çûne otaxa dinê. Di wê demê de bû girmegirma def û zurnê û qêrîna otobosan. Berbû ji otobosan peyabûn û ketine govendê.
37

Paşê çûn bal bûkê. Xezal û Karê di odeya jorîn da bûn. Berbû çûne bal wan. Xezalê di nav berbûyan da Sêvê naskir, heta wê kir ber pê here, ha dît Sêvê di hemêza wê da ye. Wê Xezal radimûsa û dor nedida wê. Paşê Xezal berda, ber bi Karê çû.
Gundiyan haziriya xwe dîtibûn û ew li hêviya vexwendiyan bûn. Nîvro, gundiyên ku karê xwe kiribûn, nêzîkî wan bûn, ew birne malên xwe. Heta êvarê te derê kîjan malê vedikir kêf bû ê şayî bû.
Êvarê, li ber derê Mecîd govend giran bûbû. Bi def û zirne diçû-ne pey goxwendgêriyan. Gava govend rind giran bû, Qaçax rabû sedbanknotek da defvan; Xezal, Karê û Sêvê kirne sergovendiyê. Sêvê wisan rind sêpê dilîst hewesa meriv dianî, lê Qaçax li Xezalê dinihêrî û qelûn li ser qelûnê dikişand. Heta nîvê şevê tevahiya gundiyan wisan lîstin, kêf kirin. Lê ji ber ku dê wê sibehê Xezal zû

siwar bikirana, dewet belav bû, da berbûrî hinekî hêsan bin. Ji bo-
na sibê bikaribin di riya dûr de biqedînin.
Berbanga sibê bû, berbûrî gişk êdî hazir bûn, li ber derê mala
Mecîd bûn. Girmegirma def û zirnê bû. Li ber derî texte rast kiri-
bûn, kêf dikirin. Şa dibûn. Wan heta du- sê saetan wisan kêf kir,
paşê bavê Ahmo ji eşqa mala bavê Xezalê, ji eşqa dê û bavê wê
vexwar û gote Mecîd:
- Mecîd, birê min, pismamê min, ez ji birê xwe zaf razî me. Tu
timî wa serfîraz û rûspbî bî! Herweha cînar û merivên te jî. Ez ji
gundiyan jî zaf razî me, yên ku îro du roj in ewqas zehmet kişan-
din û ewqas bi qedir û qîmet bûn. De gelî bira û pismaman, ev
weha hatiye û çûye; destûra me bidim, em bûka xwe bibin? Wî
kasa xwe vexwar.
Mecîd jî bi gundiyan va razîbûna xwe dane wan û destûra bûkê
dan. Cihêzê Xezalê kirne otobosê, tê da bi cîh kirin. Paşê bi def û
zirne ew ji malê derxistin. Sêvê ketibû milê wê, Ahmo jî li pey wan
38

diçû. Xezal û diya xwe digiriyan. Wê dê û bavê xwe ramûsa, xatir
otobosê siyar bû û otobos bi rê-
xwe xwest,
ji heval û hogirên
li
ket...
Xezalê kire îskeîsk. Dema Ahmo ev yek dît, bi destê wê girt,
nerm givaşt û got:
- Ezîza min, ma meriv di rojeke wisan de digrî?
Ahmo destmalka xwe derxist, hêsirên wê paqij kir. Xezalê li wî

nihêrî, paşê Sêvê ku li kêleka wê rûniştîbû û kerr sekinîbû serê xwe kire ber xwe.
Di nava çend saetan da bi eşq û kêf gihîştine nehya Artaşatê. Li wir komek kur û qîz hatine pêşiya wan. Berî tevan zûtir, Belga diya Ahmo gihîşte bûka xwe û eniya wê maçî kir û li ber wê reqisî, ew bire malê.
Sê rojan temamiya gundiyan dawet kirin û bi kêf û eşq şaya Ahmo û Xezalê kirin.
Piştî dewetê Ahmo û Xezal çûne nava bax, di bin dareke zerdelê yeka hêşîn da sekinîn; bîstikekê li nav şavên hev nihêrîn û keniyan...
39

REVARIHANE
1
Zivistan bû, zivistaneke sar. Berf qasî bejnekê ketibû. Derî û kulek xitimandibûn, vizîna bê bû. Bayê ku bagerek rakiribû, fizildûmanek wisan kiribû, çavên meriv dorberê xwe nedidîtin. Ew bagera di orta Xaç û Xidirnebû da bû. Gundiyên gundê Segerê ji şeveqê va rabûbûn, berfa ber derên xwe, ya ser xaniyên xwe paqij dikirin. îro gişk bi rojî bûn. Êdî rojiya paşîn bû. Sibetirê gere eyd bûya, loma jî gişkan ber deriyên xwe temîz dikirin; ne dê meriv bihatana malên wan û eyda wan bimbarek bikirana. Piştî kar qîzên gihîştî diciviyan, totêkên şor dipehtin. Di mala Hesenê Pîrê da jî totika şor dipehtin. Ew çar qîzên bermiraz bûn, çar heval: Beso, Zozan, Almast û Rihan, qîza wê malê.
Di dilê her yekê da niyetek hebû: Gelo di xewnê da dê kî av bida wan. Wan gazî Xwedê dikir da zû bibe êvar, ku qursikan bix-

win, razên û hezkiriyên xwe di xewnê da bibînin.
Almastê got:
- Rihan, rast bêje, tu dixwazî kî di xewnê da avê bide te?
Lê Beso bi henek got:
- Almast, tu çiqas bêfehm î! Kî nizane Rihan Mirad dixwaze, ew dixwaze Miradê şivan avê bide wê. Ew û Rihanê ji zû da çav berdane hev. Gava ew çav bi wî dikeve, tu dê bêjî ruhê wê teze dibe, dinya wê ronahî dibe.
Rihan sor bû, lê rindtir bû. Herdu dêmên wê mîna gulan sor bûn, bûne mîna xaşxaşkê
Zozanê got:.
40

- De Rihan şerm neke, çira tu sor bûyî? Em gişk jî bengî ne. Mesela ez bi dil dixwazim, ku Sûto bê xewna min, avê bide min.
Beso got:
- De qîzino bes e, werin rûnin, êdî dereng e, fitar bikin, ku hûn paşê dîwaran binexşînin: "Arvanê Xidirnebî" eleg bikin.
Qîz rabûn, her yek çû mala xwe. Wan soz dane hev, ku şeveqê li mala Hesen bicivin û ji hev ra bêjin ka kê çi xewin dîtiye.
Rihanê piştî fitarê xwe xemiland û dest pê kir ku navmalê bi arvan binexişîne. Wê li ser dîwaran qilafetên kulfetê malê gişka çêkirin, paşê qilafetên pez û yê dewêr çêkir. Di dawiyê de xêlî avîte ser serê xwe û arê "Xidirnebî" eleg kir, danî ser sitêr, şarekê avîte ser û got:
- Dayê ez zaf tî me, firek av venexum, tu çi dibêjî?
Diya wê got:
- Na, qîza min, heta niha te di ber xwe daye, hinekî din jî di ber

xwe bide. Rabe totika xwe bixwe û razê.
Rihan rabû çû totikê anî, ancax hinek xwar. Keriyê din xist bin balgiyê xwe û raza. Şeveqê çav da ew û diya xwe rabûn, tendûr dadan, savar avîtinê, ew der dane hev û rûniştin. Rihanê madekirî bû. Diya wê jê pirsî ku çi bûye, wê ji diya xwe ra negot. Di wê saetê de hevalêd wê hatin. Ew ji mal derketin, çûne derve û xewnên xwe ji hev ra gotin.
Zozanê bi eşq got ku çawan Sûto bi şerbikekî mezin av daye wê. Beso û Almastê jî bi dilekî şa xewnên xwe gotin. Lê Rihan melûl bû. Pêşî hevalan ji şabûna ew yek texmîn nekiribûn. Lê gava dora Rihanê hat, wan teze texmîn kir ku hevala wan bêkêf e. Almastê jê pirsî, got:
- Rihan, çi bûye? Ma te yekî din di xewna xwe da dîtiye?
Rihanê serê xwe hejand, dixwest bigota"na".
Got:
4i

- Ax, nizam ew çi xewn bû min dît. Heta niha jî ew mar li ber çavên min e. Marekî xwe li stûyê Mirad pêçabû û nehişt ew avê bide min.
Rihanê wisan got û kesereka kûr kişand.
Qîzikan li çavên hev nihêrîn, melûl bûn û ji Rihanê hêvî kirin, ku xewna xwe ji wan re şirove bike. Wê got:
- Min di xew da dît, ku ez zaf tî me. Li tu cîhî av tunebû, min dikire qajîn, qêrîn. Tu kes tunebû, ez di nav deşteke mezin da tenê bûm. Ez li ber zinarekî rûniştim û giriyam. Min nihêrî ji nişka va Mirad derket. Cêrek tijî av di dest da bû. Pêşî min şerm kir, bi paş va vekişiyam. Min lê nihêr ew dikeniya û ber bi min dihat. Cêrê

avê dirêjî min dikir. Hingê ez ber bi wî çûm, gava min dest avête cêr, ji nişka va, ji pişt zinêr marekî mezin derket û li lingê Mirad aliya. Min kire qîjîn... Cêr ji destê min ket, duperçeyî bû. Mar ji lingan hetanî qefesê li Mirad aliyabû. Min kire qêrîn, ez ber bi Mirad çûm, ez bi qêrîna xwe şiyar bûm. Min nihêrî ku xewn e. Qîzikan gişka lêvên xwe gez kirin û gotin:
- Xwedê bide xatirê navê xwe! Mirad gune ye, tayê bi tenê ye û wisan melûl çûne malê. Êdî cînar hatibûn, tijî bûbûn ji bo bi hev ra biçne mala Seydo Axa; tev jê ditirsiyan.
Gava ber bi mala Seydo Axa çûn êdî sibe ronahî bûbû. Ji dûrv va, ji mala wî dengê def û zirnê, dengê ken û xeberdanê dihat. Gundiyên feqîr li ber derî sekinîbûn, bizav nedikirin herne hundir, !ew vê carê pêşkêşa wan hindik bû; pezek tenê bû.
Ew ditirsiyan, ku Seydo Axa razî nebe û ji paş va bide û ji wan bixeyde. Di nav wan da Qasim hinekî bi bizav bû, ew pêşî çû û got:
- Mala we ava be,
pey min werin! Çima bixeyde, çiqas eyd e
li
em xelatan jê ra tînin, ji devê kulfetê xwe dibirin, didine wî... Vê carê jî qeweta me ancax gihîşte miykê. Careke mayin em dê tiştekî
42

qenctir bînin. Hinekî din jî bi pêş va çûn. Eyda Seydo Axa û ya kurê wî bimbarek kirin û kerrekerr bi paşva vegeriyan. Gava der-ketin derve bîhneke azad kişandin. Gundiyekî got:
- Şikir vê carê dengê xwe nekir, hinek serxweş bû!
2

du-
Di ser rojên"Xidirnebî" ra
sê meh derbas bûbûn, lê Rihanê
nikaribû xewna xwe ji bîr kira. Ji wê rojê û pê ve bi dilê kul, bi ça-
vên hêsir li çiyan, li baniyan, li ber berx û karan bû. Gelekî ji pez
hes dikir, lê ji bextê wê ra pezê mala bavê wê hindik bû: çar mî û
beranek... Çiqas roj bû ew diçû ji wan ra giha dianî û li bal wan
rûdinişt û alif dida wan. Wê derdê xwe ji pez ra digot. Pezê ku li
ber destê Mirad bûn. Wê, ew miz didan, çavên wan maçî dikir,
çavên wê tijî dibûn, bi dilekî kul digiriya. Ji wan ra digot:
- Ax, hûn heywanetên bê zar û ziman, hûn evîna dilan qet fêm
nakin? Hûn pirs nakin gelo ez ji bo çi wa kerr û lal digrîm? Hûn
qet pê dernaxin çima ez we timî maçî dikim, ne hûn herroj wî di-
bînin. Ax... Hûn nikarin... bêjine wî kula dilê min giran e.
Rojekê Rihan bi Almastê û Beso re gîha li pişta wan e, diçine
malê. Wan xeberdida, dikenyan lê Rihan melûl bû. Hevalan jê
pirsî, gotin:
- Rihan, tu çima melûl î, çi bûye?
Wê got:
- Ma hûn nizanin çi bûye? Ev çend roj in diya min nexweş e, lê
îro zaf tal e. Dinya li serê min bûye doje.
Beso berê xwe dayê û got:
- Tişt nabe Rihan, sebir bike, Xwedê rehîm e,
çi ditirsî, kî nex-
weş nakeve, diya te tim jî dikeve şikir zû baş dibe.
Rihanê got:
- Na, vê carê mîna hercar nîn e, tiştekî naxwe û bi zor diaxive.
43

Wisan bi xeberdan gihîştine ber derê Seydo Axa, ku nêzîkî mala Hesen bû. Casimê kurê Axê li ber derî sekinî bû. Wî ji serî heta lingan li qîzikan nihêrî û bi dengekî bilind got:
- Roja we bi xêr, qîzino! Hûn çiqas bi lez in? Hûn selamê jî na-din meriv? Hûn ji ku tên ha?
Almastê got:
- Em ji ku tên? Ma tu nabînî ku em ji pez ra gîha tînin? Û bi lez çû.
Casirh got:
- De baş e, qîzika delal! Wisan tê kivşê ku tu lingên xwe pirr li guhên xwa dixî, ez dê ji heqê te bême der. Lê heyf... Rihan bi te ra ye... Yan na min tu wisan rehet bernedida! Û çû malê.
Rihan êdî gihîştibû malê, li bal pez gelek nesekinî, bi lez gîha û av da wan û çû hundir; ber bi diya xwe va ya nexweş.
Xezê di nav ciya da bû, li ser piştê dirêjkirî, çavên wê girtî bûn. xwîdanê zîpik zîpik di eniya wê da dabûn der. Rihanê qasekî lê nihêrî û kir ku here. Jê weye diya wê razaye. Xezê çavên xwe veki-rin, li qîza xwe nihêrî, got:
- Rihan, emrê min, were li kêleka min rûne, ez têr te bibînim! Dibe êdî te nebînim... Ax... min çiqas dixwest daweta te bidîta, mîna ya xuşk û birayê te, paşê bimrama... Niha ez nizanim tu dê kî bistînî, bextê te dê çawan be. Yê Seyrana xuşka te û Kinoyê bi-rê te dizanim; bi pirrî bi hindikî ji xwe ra dijîn. Ax... qîza min ya herî heskirî dê bextê te çawan be? Tu dê bê min çi bikî? Tiştekî te-nê, keça min, xebera diya xwe di bîr bîne, timî li gor bavê xwe be, ji gotina wî derneyê.
Ev gotin mîna tîreke tûj di dilê Rihanê da diçûn û dilê wê yê bi-

rîndar pirrtir dişewitand. Wê nizanîbû çi bêje, dilê wê dişewitî, agir û alav pê ketibû, hêsrên mîna taviyên teyrokê ji çavên wê yên reş dibariyan. Xwe avîte ser cîhê diya xwe, got:
44

- Dayê, tu çima tiştên wisan dibêjî, tu hertim jî weha nexweş diketî, tu dê sax bibî, ji bo xwe tiştên were nebêje.
Xezê kire nalîn û got:
- Na, qîza min, rast e, ez hertim jî nexweş ketime, lê vê carê ez nikarim... Bîhna min diçike. Ez êdî dizanim, ku ez ê...
Di wextê xeberdana dê û qîzê de Kino û Seyranê jî hatin cem diya xwe. Ew li Sengerêda diman.
Gava Xezê ew jî dîtin madê wê xweş bû, got:
- Şikir ji vê rojê ra! Hûn hatin? Koma min li ser hev e, ez niha dikarim rehet bimirim.
Kino û Seyranê xwe avîtine ser ciyê diya xwe û maçî kirin, gotin:
- Dayê, twisan nebêje, em bêî te ji çira ne?
Xezê got:
- Na, ez dê bimirim, lê heyf min nedît gelo dê bextê Rihana min çawan be. Kino, tu û Seyran êdî mezin in, guhê we li ser Rihanê be!
Wan weha gelekî bi hev ra xeberdan, paşê çûne malê, bal Hesen. Dîsan Rihan tenê li bal diya xwe ma. Ew gelek rûnişt. Ji şevê gelek derbas bûbû, Xezê êdî temişî bû. Rihan rabû, lehêfa wê berda û çû ku ew jî hinek razê.
Rast e ew çû ku rehet razê, lê fikra wê tim li bal diya wê bû. Hema bi kincan va pal da, lê nikarbû razê, li ser gotinên diya xwe di-

fikirî. Ber çavên wê dibû mij, dîsan difikirî, çira diya wê ew xeber gotibûn? Gelo dibe diya wê rast digot dê ew... Ax..., na, na, diya min dê pak be. Wê di ber dilê xwe dida. Ew nikare min tenê, situxar bihêle, na, ew ji xwe ra dibêje, lew vê carê hinek xedar e.
Bi vê fikrê, ew di xew ra çû. Wê çaxê Hesen hatibû bal Xezê, pirsî, got:
- Xezê, tu çawan î? Ez li bextê te me, me ziravqetyayî neke, te
45

zaro tirsandine. Seyran û Kino hatin bal min gelekî melûl bûn, nedixwestin razên. Min ew bi zorê şandin, ku hinek razên. Lê Rihan jî roja tu nexweş î heta niha diçe- tê, tu dê bêjî serjêkirî ye. Ne xeber dide, ne ken bi dev dikeve.
Xezê got:
- Ax..., Hesen, min zaf dixwest, ku ez nemirama, min bidîta Rihana min bextewar e, lê çi bikim, vê carê ez zaf xirab im... Mêrê wê got:
- Xezê, de bes e, hinek di ber xwe bide! Ez dê ji te ra tiştekî bibêjim, lê tu niha ji Rihanê ra nebêjî. Tu dê gelek pê şa bî, gava bibihîzî. Rihana me dê bextewar be, îro min gotineke weha bihîst: Casimê kurê Seydo Axa, Rihana me dixweze, lê dê û bavê wî naxwazin; dibên "Kurê axê nikare qîza kesîban bistîne". Lê Casim dibê: "Xeyn ji Rihanê ez tu qîzên mayîn nahebînim". Ev mehek e dê û bavê wî bi zimanekî xweş li ber digerin, dikin nakin pê nikarin. Bavê wî tirs lê firandiye. Casim ji diya xwe pir lava kiriye û dê zorê daye bavê wî û ew razîkiriye. Niha dê van rojan bêne mala me, Rihanê bixwazin.
Xezê got:

- Ax, Hesen, ez ne ku pê şa bûm kulên min bi hev ra rabûn. Ji alîkî va qenc e, maleke xweş e, dewlemend in, lê ji aliyê din va xerab e. Em jar in, ew dewlemend in, dê herroj bidine rûyê qîza min. Ji aliyekî va bi texmîna min Rihan wî naxwaze. Wê ji min ra negotye, lê ez tê derdixim, dilê wê bi Mirad va ye.
Mêrê wê bi hêrs got:
- Mirad? Jinik tu çi dibêjî? Mirad şivanê wan e. Ew axa ne qîza te dixwazin û tu neqayilî... Rihan tiştekî nizane, gava pê bihese dê gelek şa be; jinik, tu çi dibêjî?
Jinikê got:
- Hesan, ez dibêjim bila qîza me wî nestîne, kîjan belengazî ji
46

wan xêr dîtiye heta ku em bibînin? Wî di kur ra qîza min ya belengaz dît, lê dibe derew be, kî ji te ra got?
- Derew nîn e, îbo ji min ra got, berdestiyê Casim yê ku bi şev û roj li mala wan e.
Xezê dîsan got:
- Ax, Hesen, min dixwest bi te ra gelek xeber bidim, lê êdî nikarim, taqet nakim. Ayyy... dilê min... ax, dê niha biteqc.ih... ih...çi...ih...ih...
Hesen bi destê wê girt, miz da, av dayê û heta berbanga sibê li ber livîna kulfeta xwe rûnişt.
Berbangê Hesen serê xwe danî da hinek razê. Xezê jî xayis ketibû. Hesen hişyar bû, dît ku Xezê rûniştiye, gazî Rihanê û zaroyan dikir.
Xezê got:
- Gunê wan li stûyê te...zû... ga...zî... ke....

Hesen çû hemiyan şiyar kir, Rihan, Seyran û Kino bi hev ra ha-
tin, lê dereng mabûn... Xezê êdî li ser piştê ketibû, serê wê di ber
da hatibû, çavên wê tenê vekirî bûn. Te dê bigota hişyar e, li riya
wan dinhêre. Ji Rihanê weye diya wê li wan dinhêre, kire qîjîn.
- Dayê, ezîza min, çira wisan dinhêrî? Em hatine, binihêre, de
bêje, te gazî me kiribû, de bêje...
Lê ew êdî tunebû... Seyranê, Kino û Hesen fêm kirin, ku Xezê
êdî tune, mîna dînan xwe avêtine ser meytê wê, lê Rihanê teze
femkir, wekî çi qewimî ye. Wê got:
- Ax, dayê, te çi kir, te çima ez tenê hiştim...
Ez dê ji kî ra bêjim "dayê"...
Qnar hatin, mal tije bû. Hinek bi wan re giriyan û hinekan jî di
ber dilê wan da.
47

3
Sibe bû. Sibeyeka biharê ya hênik. Bihar çiqas xweş e, meha biha-
rê ya pêşîn bû. Tu dê bêjî hemû qîz û xortên cahil di vê mehê da
mîna gul vedibin, kêf dikin û şa dibin. Lê ew meha xweş ya ku Ri-
hanê ji hemiyan bêhtir jê hes dikir, îsal nehatibû. Wê gelek dix-
west mîna hercar here li çiya û baniyan bigere, binhêre, yên jê ra
dikeniyan. Lê îsal, vê mehê tenê jê ra kul û derd anîbû.
Di pey mirina diya wê ra du- sê meh derbas bûbûn û Rihanê ji
dilê ku! ra gelek hêsir rijandibû ser sûretê mîna gula sor.
Tu carî bawer nedikir, ku ew bê dayik e û hertim diçû ser meze-
lê wê, li ber rûdinişt, çi derdê wê hebû jê ra gilî dikir. Wê kulîlk
diçinîn, ezîz girêdidan, baq baq datanî ser mezelê dayika xwe, ke-
logirî dibû û digot: "Diya min ya ezîz, te ji kulîlkan gelek hes di-

kir. Ez dê ji te ra herroj bînim. Mîna hercar, lê ji bo ku neçiimisin ez dê wan bi hêsrên çavên xwe av bidim".
Bi vî awayî ew herroj dihat, kulîlkên teze dianî, gelek rûdinişt, digiriya; kela dilê wê dadiket û diçû.
Hercar merivek li pey wê dihat, lê wê nedidît çi kes e. Wî xwe ji wê vedişart. Wexta ku ew diçû dîsan dida pey, diçû heta gund. Ew jî wek Rihanê digirya, radibû bi dizîka diçû, xwe nîşanî wê nedida. Dilê Rihanê hîn şikestî bû û wî şerm dikir here balê û di derheqa kula di dilê xwe da pê ra xeberde. Ew xort Mirad bû, heskiriyê Rihanê.
Rojekê, mîna herroj Rihan dîsan kulîlk çinîne, melûl melûl serî di ber da, di riya xwe ya herroj da diçû. Deng û his ji tu ciyekî ne-dihat, tenê carina li ber lingên wê dibû xişexişa hêşînahî. Yan jî di ser serê wê ra dibû çîveçîva çivîkan, difiriyan. Rihanê serê xwe bi-lind dikir û li wan çivîkan dinhêrî. Di dilê xwe da digot: "Ev çiqas bextewar in, ne derdê wan heye ne jî kulên wan, azad in, bi kur
48

va bixwazin, diçin, çi bixwazin, dikin".
Di wê dema ku weha difikirî da dengek bihîst. Ji wê weye yekî bangî wê kir, yekî ji nêz va bang kir, Mirad bû. Mirad ber bi wê dihat.
Rihan di cîh da sekinî, çokên wê sist bûn, ber çavên wê reş bûn, dêmên sor bûne mîna gulên mihemedî, lêvên sor yên kaxezî nerm çûn û hatin, got:
Mirad...
Lê zêdetir nikaribû tiştekî din bigota. Mirad hêdî hêdî nêzîkî wê bû, got:

- Roja te bi xêr Rihan! Emrê min! Tu ji min nexeyde min êdî nikarîbû îdare bikira, derdên min ewqas pirr in min nikarbû tu bidîta û ji te ra bigota.
Rihanê got:
- Mirad, tu çi dibêjî? Bila derdên te tunebin, tu çima wisan dibêjî? Şikir diya te sax e, nexweş nîn e, halê te baş e, çi derd û kul in? Kulfetê mala we ne giran e, tu û diya tenê ne.
Mirad got:
- Ax.. Rihan, tu hîn zaro yî, tu nizanî çi di dilê min da ye. Tu cahileke wisan î... çawan bêjim? Çend sal berê, wextê me çavgirtinokê dileyist û te ji hemiyan pirrtir dixwest tev min bilîzî. Lê niha Rihan, ez ew zaro nîn im, raste min berê jî, ji te hes dikir. Me timî bi hev ra dilîst, lê niha cûrekî mayîn e, ez bi cûrekî din ji te hes dikim. Niha tu ji min ra hemû tişt î, tu dinya min ya ronahî yî, Rhan... Ronahiya çavên min, ez bê te nikarim bijîm! Timî dixwazim li bal te bim, bi te ra xeberdim û li te binihêrim. Di ser wê rojê ra çar meh derbas bûne, ji çaxa diya te ya rehmetî wefat kiriye, tu herroj têyî vir û ez jî bi te ra me. Ez nikarim te tenê bihêlim. Niha te derdê min fêm kir, kula min çi ye, Rihan? De tu ji bo çi bêdeng bûyî, xeberde?
49

Rihanê got:
- Ax... Mirad, niha ne wextê tiştên wisan e, dilê min hîn birîndar e! Ez nizanim çi dikim. Ez hay ji serê xwe tuneme. Diya min ez stûxwar kirim, niha di derheqa tiştên wisan da neaxive.
Rihanê wisan got û berbi mezelê diya xwe çû. Mirad jî li pey wê çû û hêdî gote Rihanê:

- Rihan, bibexşîne, delalya min, min şaşî kir, diviyabû min ji te ra negota, lê çawan bikim? Ez ne gunehkar im, dilê min yê birîndar gunehkar e, êdî min nikaribû îdare bikira. Na, Rihan ez nikarim bêî te îdare bikim. Divê tu tiştekî bêjî, Rihan!
Rihan bîstikekê sekinî heta Mirad nêzîkî wê bû, paşê got:
- Mirad, tu dixwazî ez bêjim? Tiştek ji destê min nayê. Ez çi dikarim bikim? Divê tu bêyî bal bavê min, pê ra xeberdî, ew dizane.
Mirad got:
- Rihan, bersiva te ev bû? Tu çawan wisan dibêjî, belkî bavê te, tu neda min, hingê ez dê çi bikim? Tu ya dilê xwe bêje, tu min dixwazî yan na? Lê ez dê bavê te serwext bikim.
Rihanê got:
- Mirad, wê yekê ji min pirs neke, ez çi bêjime te?
Rihanê wisan got û sor bû. Hingê Mirad fêm kir, ku Rihan şerm dike, naxwaze gotina rast jê ra bêje, lê çavên wê rastî digotin. Çavên rwê astiyê ji Mirad ra digotin, digotin ku ew ji Mirad hes dike. Ew jî wek wî nikare bêî wî bijî. Wê gelek caran ew di xew da dîtiye, li bal rûniştiye û bêî wî nikare biqedîne, lê nedigot. Nedigot ku ew jî, ji bo Mirad pirr caran giryaye. Mirad ev rewş gişk fêm kir, got:
- Rihan, wekî wisan e ez ê diya xwe û du meriyên din bişînim bal bavê te; bila niyeta wî bizanibin.
- Erê Mirad, wisan baştir e. Niha here, ez dixwazim tenê herim bal diya xwe, pê ra xeberdim. Here, nebaş e, hinek ê me bibînin.
50

Mirad çû, lê pirr dûr neket li ber tilmekî sekinî heta Rihan hat û pêra çû gund, lê nehişt ew bibîne da şerm neke.

4
Wê rojê li mala Hesen gelek meriv hebûn, ew xwezgîniyê Rihanê bûn. Tev şa dibûn, dikeniyan. Rihan û hevalên wê li odeyê rûniştibûn û xeber didan. Almastê got:
- Rihan, Seydo Axa hatiye, bavê te jî qayîl bûye, tu jî naxwazî dê çawan bibe? Gava Miradê belengaz pê bihese dê çi bike?
Zozanê li Rihanê nihêrî û got:
- Rihan ez herim bêjim wî, belkî tiştekî bike.
Almastê bi dilovanî got:
- Feqîrê Xwedê dê çi bike?
Rihanê li hevalên xwe nihêrî, demekê fikirî û got:
- Na, bila ew hîn jî nizanibe. Zozanê rast got:"Feqîro dê çi bike?" Ne dikare xeber bide, ne jî dikare şer bike. Di destê bavê min da bû, ku wî ez nedama wan nikaribûn tiştek bikirana. Min ewqas ji bavê xwe lava kir, ez giriyam, lê wî bi ya min nekir. Ax... diya min sax bûya wê bi ya min dikir. Wê dikariîbû bavê min serwext bikira. Bavê min dibêje: "Tu fêm nakî, tu dê bextewar bî. Ev dewletî ne, nav mala wan xweş e. Ez ji xeynî wî te nadim tu kesî. Diya te ya rehmetî jî digot, ku ez wisan bikim tu dê bextewar bibî. Tu sitûxwar nabî. Tu ji vî bextî baştir çi dixwazî. Tu zaro yî, ev îşê te nîn e. Ez bavê te me û ez te didime wî!" De bêjin? Ez piştî van xeberên bavê xwe çi bikim?
Rihan digiriya û ji wan ra digot.
Zozan rabû û got:
- Ax, ya Rebî em çima ewqas bedbext in, ewqas hêsîr û sitûxwar, kengê em ê jî bibine meriv? Me jî wek merivan hesab bikin û me bi dilê me bidine mêr?
5i

Almastê got:
- Ê, Zozan te çi wenda kiriye, tu li çi digerî? Bavê min jî bi zorê ez ji bona çend qurûşan dame wî merivî, yê ku min jê hes nedikir. Lê hûn dizanin ev çiqas e ez di çi halî da me? Ez şev û roj digirîm. Lê bavê min ji xwe ra digere, kêf kêfa wî ye; ne xema wî ye ez di çi halê da me. Du mehên din şûnda dê min siyar bikin. Diya min ya feqîr gotê: "Kuro, tu çi dikî, ew kal e, layiqî Almastê nîn e, ew wî keftarî naxwaze". Lê bavê min ji ciyê xwe rabû û bi hêrs ji diya min ra got: "Qîzê, tu here karê xwe yê jinan bike, ev ne karê te ye, tu ji ku dizanî kî baş e, kî xerab e? Ez dizanim qîza xwe didime kî. Rast e, deh panzdeh salan ji Almastê mestir e, tiştek nabe. Mala mêrikî xweş e. Dewlemed e; çira te ne bihîstiye civat dibê: "Bike kala, bixwe mala, çi bikim ji xortên kundir vala!". Jinik de niha here ser çixwilê xwe, êdî di derheqa vê yekê da, ji min ra tiştekî nebêje. Min qîza xwe daye, çûye". Xwîşkino, bavê min jî weha got. Em dikarin çi bikin? Hersê heval rûniştin, ji halê hev ra giri-yan. Piştî ku mêvanê mala Hesen belav bûn, Almastê di ber dilê Rihanê da, hinekî din jî rûnişt, paşê çû.
Gava hevalên Rihanê çûn, Hesen nêzîkî qîzikê bû û got:
- Ev dêlik in. Te çawan dixwest lingê xwe li bextekî weha bixis-ta? Du- sê mehên din şûnda dê te bibin. Hingê tu dê bibînî ku ba-vê te çi qencî bi te kiriye ku bi ya te nekiriye. Niha aqilê xwe bici-vîne serê xwe, ne fikire xelk dê bi te bikene, gava seh bikin tu kurê Seydo Axa naxwazî.
Rihanê xwe zeft nekir, kelogirî bû, got:
- Bavo, ez nikarim di nav mala wan da bimînim, ez hînî azadiyê bûme, ez dixwazim ji xwe ra bê xem bigerim. Lê mala wan mîna

kele ye, kî dikevê êdî nikare jê derkeve.
Bavê wê got:
- Tişt nabe qîza min, tu dê berebere hîn bibî. Qet xeman neke.
51

Piştî vê yekê Rihanê dît bêmane ye, nikare bavê xwe serwext bike, ew hişt, derket û çû.
Serê şeveqê, piştî karê navmalê Rihan dîsan çû kulîlk çinîn, baq baq kirin û çû ser mezelê diya xwe da derd û kulên xwe jê ra bibêje û hebekî hêsa bibe. Ew vê carê gelekî li ber mezel rûnişt û giriya.
Rihanê digot û digiriya., Gava wê li pişt xwe dengê lingan bihîst, rabû piya û sekinî. Mîna hercar dîsan sor bû, lêvên narîn çûn û hatin. Lê gotin ji devê wê derneket. Çavên reş ku hercar ji şabûna dibiriqîn vê carê tije hêsir bûbûn, melûl melûl berjêr dinihêrîn. Mirad li Rihanê dinihêrî, fêm kir ku Rihan vê carê bêkêf e, gelek melûl û dilşikestî bû. Wî bi tirs pirsî, got:
- Rihan, emrê min, tu çima îro bêkêf î? Çi qewimî ye, dibe ku xalê min Hesen nexweş be? Yan jî... De bêje, Rihan tu çima xeber nadî?
Rihan kerr bû, te dê bigota ew dengê Miradê şêrîn di xewriêda dibihîze. Wê nikaribû tiştek bigota, derdê xwe bigota. Wê nizanîbû çawan bêje da dilê Mirad neêşîne, lê wext kin bû. Wext tunebû, ku bifikire û çi jî bigota dê dilê Mirad bima, dilê wî dê biêşiya. Gava careka din dengê Mirad bihîst, Miradê ku li nav çavên wê dinihêrî, Rihanê êdî nikaribû xwe zeft bikira, kire axîn û bi girîn got:
- Mirad, here min ji bîr bike! Ji xwe ra qîzeka din bibîne, ewqas

qîzên baş hene, layiqî te hene. Ez çi me, tu min dixwazî? Bavê min ez dame yekî din.
Mirad di cîh da sar bû, erd di bin da çû û hat, serî lê gêj bû, bi zorê xwe zeft kir, ku nekeve, got:
- Rihan, ev tu î ji min ra wisan dibêjî? Tu di nav du rojan da ça-wan hatî guhertin, te çawan ez ji bîr kirime? Bi min ra henekên wisan meke! Rihan, tu çima min dikujî, bêje çi bûye, axir me soz
53

da hev, min dê xwazgîniyên te bişanda, ev çawan qewimî ye?
Rihanê got:
- Ew kurê Seydo Axa ye, Mirad. Ew hatin bal bavê min û wî jî ez dame, bi rastî min gelek lava kir, lê lavayên min tiştek nekirin. Wî bi ya min nekir. Gustîlik kirine tiliya min. Mirad, ez ji wî hes nakim, lê ez çi bikim? Heke tu dikarî tiştekî bikî, bike. Min jî, xwe jî, ji vê zilmê xelas bike! Mirad, min azad bike!
Rihanê weha got û mîna teyrokên biharê ji çavên reş hêsir bi ser rûyê sor da bariyan.
Gava Mirad ev yek bihîst, pêlên dilê wî rabûn, xwest hemû axa û dewlemendên ku kul û derd xistine dilê jar û feqîran perçe perçe bike, wan ji rûbarê dinyayê bide hildan. Lê wî dikaribû çi bikira.
Bi dilekî şikestî û melûl bersiva Rihanê da, got:
- Rihan, negirî û ne jî bifikire, ez dê tiştekî bikim, eseyî, lê niha nikarim bibêjim. Ez dê niha herim mal ji diya xwe ra bibêjim, pa-şê jî ji hevalên xwe ra bibêjim. Ez dê binihêrim çika çi dibêjin. Ku tu careke din hatî vir, ez dê bersivekê bidime te. Niha here malê, min ji te ra çi gotiye ji tu kesî ra nebêje. Nefikire, heta Miradê te sax be nahêle tu bibî jina Casim Axa! De here nazika min, heta ku

ez bifikirim, ez dê ji te ra bêjim.
Rihanê got:
- Mirad, delaliyê min, tu heta dikarî zû bike. Li gor gotina bavê min dê daweta min zû bikin.
Mîna hercar Mirad li pey Rihanê hat heta perrê gund, paşê çû mala xwe bal diya xwe ya pîr. Ka ew dê çi bêje? Gava diya wî ew dît pêre pêre pê derxist, ku kurê wê bê kêf e yan jî tiştek qewimî ye. Ber bi wî çû, bi tirs jê pirsî:
Mirad, sihet û qeweta min, tu çima madekirî yî çi bûye, dibe tu nexweş bî, an hinekan kêfa te şikandine? De xeberde, kurê min, çi bûye, çi qewimî ye? De bêje, dibe ku ez bikaribim alîkariya te bi-
54

kim, de bêje perrên min?
Mirad bi dilekî kul çi hatiye serê wî, got:
- Dayê sebeb ev e, lew ez melûl im. De niha bêje, ez çi bikim, ez tu caran nahêlim, ku kurê axê Rihanê ji xwe ra bibe, dîl bike. Ev tişt piştî mirina min dibe. Dayê, tu çawan dibînî, te dinya pirr dîti-ye, şîretekê li kurê xwe yê dilbikul bike. Ez çi bikim, çawan bikim, ku Rihan nebe xwarina wî kûçikî?
Dapîra Mirad piştî van giliyan sar bibû, herdu milên wê pê da daketibûn, got:
Mirad, kurê min, ez dizanim tu ji Rihanê pirr hes dikî, lê tu dê çawan bikî, ku hem wê hem xwe û hem jî dapîra xwe xelas bikî? Rihê min, tu dizanî tu ronahiya min î, ku tiştek bi te bê ez dê dîn bibim, bikevime çolê. Were bi ya diya xwe bike, li pey vê yekê ne-çe. Tu kî yî, kî li te dipirse? Tu şivanê wan î. Tu çiqas bi qewet bî jî tu kes nayê alîkariya te, qîzeke bila bibin, dev jê berde, lawê

min.
Mirad nehişt ew zêde xeberde, rabû, ji hêrsan dilerizî, got:
Dayê, bes e! Van giliyan ji min ra nebêje. Em tev wek te difiki-
rin, lew jî em hatine vê rojê. Çawan ez bi tenê me, kî ji te ra got ez
bi tenê me? Pirraniya gundiyan ji rihsitînê xwe razî ne, lê ji Seydo
Axa ne razî ne, tu çi dibêjî? Lê ew nizanin çawan ji heqê wî bêne
der, ku yek qeweta xwe nîşan bide, dê hemî jî xwe bidine pişt wî.
Vî Seydo Axayî mala xelkê xera kiriye.
Diya wî got:
- Delaliyê min, madem wisan e, Rihan ji te hes dike, sozê xwe
bikine yek, mala xwe bihêlin û herin aliyê Tibîlîsê. Hingê tu kes
nikare Rihana te ji te bistîne. Ez û tu, em dê li wir bixebitin û abo-
riya xwe bikin. Çend nasên min jî li wir hene.
Gava Mirad ev xeber bihîstin, di orta wî û esman da bihostek
ma, got:
55

- Dayê, te tiştekî çiqas baş got. Ez dê niha herim bal hevalên
xwe ka em dê kengê herin. Lê tu jî karê xwe bike, binhêre em çi
tiştî bi xwe ra bibin. Her tiştî neyne. Tiştê ku ji me ra pirr lazim be
wî bîne. De ez çûm da bêjime hevalên xwe.
Wî wisan got û ji malê derket...
5
Havîn bû. Qijeqija tavê bû, roj ketibû germa nîvro. Pez hatibû da-
nê nîvro, lê sekinî bû, lew şivan bi tiştekî din va mijûl dibû. Mirad
wê rojê li hêviya Rihanê bû, çika wê çi bigota dê razî bibûya an
na. Ew sê roj bûn ku Mirad diçû bal mezelê diya wê ji sibê hetanî
êvarê dima, lê ew nedihat. Mirad kete mitalan, gelo dixwaze Ca-

sim bistîne loma nayê? Wê rojê jî Rihan nehat. Roja çaran, ku Mirad bawer nedikir bihata, hat. Gava nola hercar dît, ku dîsan baqê kulîlkan di dest da ye û tê, bawer nekir. Rihanê dîsan melûl ber bi mezelê diya xwe diçû. Wê li Mirad nihêrî, gava Mirad dît ew dikene hinek rih pê da hat. Ew nêzîkî wî bû, got:
- Mirad tu çiqas şa yî, dibe te tiştek kiribe, ji min ra jî bêje. Ev çend roj in ez mirim, Kino û Seyran hatine, ji bo dawetê karê min dikin. Wan nedihişt ez werim ser mezelê diya xwe, digot: "Em dê bi tevahî herin", ancax îro min xwe ji wan dizî û ez hatim. Duh Seydo Axa hate mala me, got: "Ez dê bûka xwe zûtir bibim, çiqas zû be ewqas baştir e". Bavê min û birê min soz dan ku serê vê me-hê dawetê bikin. Deh roj mane. Mirad, zû tiştekî bike, ez nikarim, ez dê xwe bikujim, lê naçim wê malê.
Mirad got:
- Rihan, tişt nabe. Rihana min, tu fikran neke, ez dê wisan bi-kin, ku tu bibî ya min.
Mirad çawan qerar girtibû, yeko yeko ji Rihanê ra got. Rihan ji şabûna giriya, xwe avête hemêza Mirad, got:
56

- Mirad, de zû min azad bike!
Dîsan ji kêfa giriya. Piştî hinek girîn sekinî. Mirad got:
- Rihan, pênc roj şûnda em dê herin.
Wi dixwest, ku Rihan tedareka xwe bike, bi şev ew dê li ber mala wan, li benda wî be û ew dê ji wir bi tevayî herine Tîbîlîsê.
Rihanê got:
- Belê Mirad, ez dê hazir bim û li hêviya te bim. Ez ditirsim, ku dê me bibînin. Ax, Mirad ez ji wî Casimî çiqas hes nakim. Ji min

weye ew dijminê min yê herî xerab e. Tu zû min ji wî xelas bike, bibe bi kur va dibî bibe. Ez ya te me, bi kur va dibî, bibe. Civatê rast gotiye: "Bira dil bi dil be, bira tûrê parsê li mil be, bira ew jî binîqul be!". Bila em li bal hev bin, bila em tî bin, birçî bin.
Mirad got:
- Kulîlka min, ronahiya dinya min, tu rast dibêjî. Ez bimirim jî ez dê rehet bim, lew dizanim tu ji min hes dikî.
Mirad bi eşq van gotinan digot, lê Rihan ji şerma sor bû, şavên reş berjêr kir, li erdê nihêrî. Paşê serê xwe rakir, bi beşereke xweş li Mirad nihêrî, got:
- Mirad, ez dê êdî herim, hîn ku kesekî em nedîtine. Pênc rojên din şûnda ez dê li hêviya te bim.
Rihanê wisan got û ber bi mezelê diya xwe va çû.
Rihan ber bi malê diçû, bi rê va rastî Almastê hat. Bi tevayî, bi xeberdan çûne malê.
Li mal, Almastê jê pirsî ka Mirad pê hesiyaye an na. Rihanê ji Almastê ra got:
- Almast, me qerar girtiye an em dê bimirin yan jî bigihîjine mirazê xwe. Pênc rojên din şûnda ez dê pê ra herim. Hingê Seydo Axa çi dixwaze bila bike, ez êdî ji mirinê natirsim. Bila min bikuje, ne ez dê li bal Mirad bim! Li kêleka wî...
Gava Almastê ev yek bihîst hêsiran di çavên wê ra avîtin, got:
57

- Ax, Rihan çiqas baş e, Mirad şêr e, xweziya çend merivên din jî mîna wî bikirana êdî van axa ewqas rû nedistandin.
Rihanê got:
- Almast, lê ez zaf ditirsim. Ji min weye ew marê di xewna min

da Casim e, ew çawan bike nahêle em bigihîjine mirazê xwe.
Almastê got:
- Rihan, wisan dîn dîn xeber nede, tu çi dibêjî, hûn dê wisan herin, ku ew qet we nebîne.
Rihanê got:
- Ez nizanim û naxwazim bifikirim jî, lê...
Herdu hevalan heta derengî bi hev ra xeberdan. Gava Almast çû Rihanê jê xwest, ku Zozanê û Beso bên ew wan jî bibîne.
6
Gundê Sengerêda gelek haziriya xwe dikir. Daweta kurê Seydo Axa nêzîk dibû. Mala bavê bûkê jî haziriya xwe dikirin; Seyran û Kino jî hatibûn malê. Kincên Rihanê kirîbûn, cihêzê wê hazir kiribûn. Hesen jî tevî çend cînaran pez serjê dikir. Kebaniyên cînaran hatibûn, li ser sêlê nan dipehtin. Di wê malê da herkesî karek dikir, hemiyan haziriya xwe dikir. Tev şa bûn û beşera wan xweş bû. Di wê malê da yeke tenê tu kar nedikir, difikirî û melûl sekinî bû.
Qnaran digotine wê:
- Rihan, tu çima melûl î? Delalê, bextekî baş hatiye ser te. Qet nefikire.
Li gor hinekan jî wê şerm dikir. Lê hinekan jî digot, "Ew ji şabûnê sewsî bûye". Lê Rihanê tenê bi kula xwe dizanîbû. Ew tim difikirî, gelo dê êvarê çawan be, dê bikaribe di wextê xwe da here cîhê civanê xwe û Mirad yan na, dê bihêlin ew ji hundir derkeve? Wê mitala van tiştan dikir, dizanîbû riya wan girtiye û pirr zehmet
58

e. Wê dizanibû kurê Seydo Axa wan wisan bi hêsanî bernade. He-

valên wê hatibûne cem, lê nikaribûn li wir biaxiviyana. Cariya mala Seydo Axa ku ji bo alîkariyê hatibû şandin li wir sekinîbû. Wê guhên xwe li wan bel kiribû, guhdariya wan dikir. Zozanê ev yek texmîn kir û got:
- Rihan, me rê girtiye, em nahêlin kes derbas bibe, em nahêlin kar bikin. Rabe em herin odeyê. Wan wisan kir. Cariya Seydo Axa pêrepêre li pey wan çû û guhê xwe da ber derî. Wê çaxê qîzikan di derheqa Mirad da xeberdida. Almast çûbû mala wan pê hesiyabû ka Mirad çi kiriye dê kengê bê pey Rihanê. Almastê got:
- Ez çûm, Mirad bi eşq ber bi min va hat. Pirsa te kir û ez birime tewlê, hespê ku kiriye nîşanî min da, got ku ew dê nîvê şevê bê, di wexta ku tev razayî bin da. Tu hazir li hêviya wî be! Gava te dengê wî bihîst, bi nermî derkeve der. Kes pê nehese, ew tev di mal da ne, herkes bi tiştekî va mijûl e. De niha em dê herin êdî şev e. Tu jî karê xwe bike. Mirad digot: "Bila ji xeynî kincên xwe pêştir tiştekî hilnede". Wî hemû tiştên lazim hildaye.
Hevalên Rihanê ew hemêz kirin, hev maçî kirin û her çar bi ser hev da giriyan.
Beso dilûrand, bi girî got:
- Ax, Xwedê, ev çi zilm e, te aniye serê me? Çima dê Rihan ji me biqete, çima dê bi dilekî kul mala bavê xwe bihêle, biçe cîhekî xerîb?
Bi dilşewatî hevala xwe maçî kir. Zozanê jî got:
- Rihan, miqateyî xwe be, nefikire, xortekî mîna Mirad li pişta te ye. De bi xatirê te, hevala me ya ezîz. Em heta xweş bin, li rûbarî dinê bin te ji bîr nakin.
Zozanê wisan got, careke din jî hatin rûyên hev û çûn.
Pero xeberdariên wan tev seh nekir, ji ber çûn û hatina xelkê.

Gelekan jî tişt ji Pero dixwestin û wê nikaribû baş guhên xwe bida
59

keçikan. Lê wê fêm kiribû ku Rihan dixwaze wê şevê tiştekî bike;
.
bi lez çû mala Seydo Axa. Ew çû cem Casim, ku wê şandibû bal mala Rihan ka çi heye, çi tê xeberdan. Çaxê Pero çû li ber derî rastî Casm Axa hat. Casim bi çend hevalên xwe ra derdikete der-va. Pero lezand ku xwe bigihîjîne Casim, lê xanima wê deng lê kir, got:
- Qîzê Pero, tu çima hatî, ne min tu şandibû, ku tu alîkariya wan bikî? Ew heta sibê karê xwe xelas nakin. Jina mezin di mal da tune. Zû here bigihîje wan!
Çiqas qudûm di çokên Pero da hebûn, lezand, lê ne ji bo here mala Hesen ji bo xwe bigihîjîne Casim. Tiştê ku bihîstiye jê ra bê-je. Lê Casim çûbû, wê ew nedît. Pero fikirî, ku here ji xanima xwe ra bêje, lê dudilî bû. Wê û Casim li hev kiribûn dê Casim pere bi-da wê, lê Xanimê ev yek nedikir. Serê Pero wisan tevlihev ber bi mala Hesen va diçû, ji dûr va dengê Casim bihîst. Casim got:
- Pero, min tu dîtî, dibe te tiştek bihîstibe? Zû bêje, çi lazim be ez dê bidim te.
Pero got:
- Erê, Axayê min, heke tu dixwazî rastiyê bizanibî tiştek heye. Rihan diwaze îşev tişekî bike, lê çi ye ez nizanim. Wê bi hevalên xwe ra xeber dida, digiriya. Ji ber ku xelk pirr diçûn û dihatin min baş seh nekir, pirr hêdî xeber didan.
Casim çavên xwe cinoyî kirin, li Pero nihêrî û bi hêrs xeber da:
- Min dizanibû Rihan dixwaze îşev tiştekî bike, lê çi ye ez niza-

nim. Min tu ji bo vê yekê şande wir da tu bizanibî Rihan dixwaze çi bike? Ha ji te ra van peran, nesekine, zû here guhdarî bike. Binhêre ka Rihan çi dike, hema şika te çû ser tiştekî zû were ji min ra bêje.
Gava Pero pere dîtin, çav lê çirisîn, ken bi devê wê ket û bi lez çû.
60

Wexta Pero hat Rihan ketibû odê, kincên xwe hazir dikir. Gava Pero bi maniya şerbik hate odê, Rihan vegeriya lê nihêrî, dît ku Pero jî lê dinihêre. Pero bi teherekî wisan li Rihanê dinihêrî, te dê bigota dixwaze jê bipirse, "Ma tu dixwazî çi bikî? Xweziya min bizanîbûya tu dê îşev çi bikî"û ji bo vê yekê jî pere sitendibû Rihanê jî xwe bi xwe digot: "Gelo wê bi tiştekî dernexist, wê nedît ku min kincên xwe bi cîh dikirin?". Lê wan bi hev ra axaftin nekir, Pero çavên xwe li şerbik gerand, nedît ji odeyê derket û çû. Wê çaxê Rihan dîsan kete nav kincên xwe, çend heb helbijartin û yên din careke mayin kire qutiyê. Wê êdî karê xwe kiribû, lê hîn jê ra zû bû. Rihan derket, çû cem Seyranê û cînarên din, ku xwarin hazir dikirin. Paşê dîsan çû odeyê, rûnişt. Dilê wê lêdixist. Şev çiqas diçû ew nikaribû di cîhê xwe da rehet rûne; diçû û dihat. Carncarna guhê xwe dida ser yên malê, lê hîn kes ranezabû, diçûn û dihatin, kar dikirin. Rihanê fitilî li paş nihêrî, bala xwe dayê, ku wa Pero sekiniye û li wê dinihêre. Gava Pero dît, ku Rihan li wê dinihêre, got:
- Rihan, Seyran dibêje: "Bila bê nan bixwe" û çû.
Rihan kete nava xeyalan, "Çima ev jinika han li wê dinihêre, dibe ku bi ser hisan ketibe, ku zanibe gelo dê bêje?". Dil wê digot:

"na". Gava wê dengê Seyranê.bihîst û derket wisan difikirî. Seyra-
nê got:
- Rihan, xwîşka min a şêrîn, tu çima naêyî xwarinê naxwî? Te
tiştek nexwariye, were û hinek xwarin bixwe û razê; tu dê sibe zû
rabî, lê em dê hîn jî rûnin.
Rihan bi van gotinan kêfxweş bû, şa bû ku here, got:
- Seyran, ez westiyayî me, lê xuyaye hûn dê heta dereng rûnin.
Ez ciyê xwe li odê datînim, ew der hênik e.
Seyranê got:
- De tu dizanî, ku tu tenê netirsî here şêrîna min. Tu îşev mêva-
61

na me yî, çawan dixwazî wisan bike.
Rihan çû. Pero jî pê bi pê li pey wê çû. Rihanê ew nedîtibû, xwe
bi xwe got: "Ax, Xwedê dê kengê bê? Ez êdî nikarim. Gava li pişt
xwe fitilî, Pero dît, got: "Ax Pero, dê kengê sibe bê em herin?
Pero bi ken got:
- Xanima min, zaf lez neke, hindik ma. Tu tenê natirsî, ez bême
bal te?
Gava Rihanê ev xeber bihîstin, çokên wê sist bûn, got:
- Na, na, Pero tu here alîkariya Seyranê bike, ew gune ye. Ew
tenê ye, cînar dê niha herin, ez ê jî niha razêm.
Pero lêva xwe gez kir û çû navmalê. Tebatî pê nediket, hinek
kar dikir, diçû guhê xwe dida ser derî, guhdarî dikir.
Êdî nîvê şevê bû, baran hûrik hûrik dibarî; şevereş bû. Şevereşe-
ke wisan ku meriv tilî di çavên hev ra bikira, hev nedidît.
Maliyên mala Hesen gişk razayî bûn, tenê Rihan ranezabû. Ga-
va wê çirpînek dibîhîst, dilê wê hildiavît; ber bi derî dîreviya. Di

vê şevereşê û baranê da Pero jî ranezabû, li mala Hesen mabû; wan nehîştibû ku ew wê şevê here. Gava çirpînek dihat ew jî radibû, li çaraliyê xwe dinihêrî. Ber bi odeya Rihanê diçû, lê guhdarî dikir, paşê dîsan vedigeriya dihate nav ciyê xwe. Ew bi vî awayî çar- pênc caran rabû, li derdorê xwe nihêrî. Yên din gişk razayî bûn. Xirexira Hesen dinya hildabû. Wî wisan dikire xirîn, nedihişt ku Pero dengan bibihîze.
Rihanê sê caran dengekî mîna dengê çivîkan seh kir, wê dizanîbû ew Mirad e, yê hatiye ku wê azad bike. Lê ew dê çawan here ku kes wê nebîne. Dilê wê hildiavît, destên wê dilerizîn. Wê jî nizanîbû ka ji bo çi digirî; laşê wê diricifî. Hêdîka derî vekir, nihêrt ku kes tune bi pêş va hat. Wisan bi tirs bi pêş va hat, giha heta ber sivderê, li ber derî sekinî, li aliyê malê nihêrî. Birê wê, bavê wê û xwîşka wê li wir razayî bûn. Keserek hatê û derî vekir. Êdî ew li
62

derva bû û piştî çend deqeyên din jî dê bigihîje Mirad. Tu kes belê êdî tu kes nikarîbû wê ji Miradê wê bi dûr bixe, destên wan ji destên hev derxîne. Gava ew derket, baranê birîbû, heta nîvê şevê jî, ji bo wan ronahiya xwe zêdetir kiribû. Te dê bigota ew jî bi wan ra şa dibû. Hewa xweş û hênik bû. Rihan hêdî hêdî ber bi Mirad û hevalên wî çû, ew jî li hêviya wê sekinî bûn. Wan bi lez Rihanê hilda û wenda bûn. Di wê maweyê de Pero çû li odeya Rihanê nihêrî, lê dît ku Rihan ne di nav cîhê xwe da ye; bi lez ber bi mala Seydo Axa bazda. Hingê Mirad, Rihan dabû ber dilê xwe û bi lez ber bi aliyê mezelan va diçûn. Diya Mirad û hespa wan jî li hêviya wan bûn. Gava gihîştine cîhê civanê, diya Mirad Rihan da ber pêsîra xwe û ew maçî kir, got:

- Delaliya min, sehet û qeweta min, ez êdî namirim, min ev roj jî dît! Xwedê we bi hev ra kal û pîr bike!
Mirad û hevalên wî zû zû tiştên ku lazim bûn avîtine ser hespê û gotin, ku Rihan li hespê siwar bibe. Lê Rihanê ji wan lava kir, ku berê here ser mezelê diya xwe, xatir jê bixwaze.
Rihan û diya Mirad çûn ser mezelê diya Rihanê, lê Mirad li cem hevalên xwe li ber hespa xwe ma. Rihan çû ser mezelê diya xwe, maçî kir, got:
- Dayê, şêrîna min, bi xatirê te, tu qîza xwe gunehkar neke. Ji min nexeyide, ez bi kur va jî herim tu dê hertim bi min ra bî. Ezîza min...
Rihanê wisan got û careka din jî mezelê diya xwe maçî kir û ji mezel dûr ketin. Herdu gihîştine cem Mirad, Mirad zû zû Rihanê li hespê siwar kir, dikir ku ew jî li hespê siwar bibe dengê teqînekê ji nêz va hat. Rihanê kir nalîn û ji ser hespê kete ser milên Mirad. Rihanê bi tirs li Mirad nihêrî û got:
- Mirad, zû bireve, ew pê hesiyanej dê te bigirin, here!
Mirad li Rihanê nihêrî, dinya li serê wî bû doje. Gava ku pê he-
63

siya destên wî ji xwînê şil bûne, li diya xwe ya ku digiriya nihêrî û got:
- Dayê, zû paçekî bide min!
Diya wî paçek dayê. Wî ew paç li birîna Rihanê pêça û ew he-mêz kir. Wisan bi sîngê xwe va guvaşt te dê bigota qey dibêje "Tu kes nikare ji min bistîne". Xwe di nav mezelan da veşartin, paşê derketin ser rê. Hevalên Mirad, Cimo û Misto gotin:
-Li wî alî çiyayek heye, em bi wir va herin; di wî çiyayî da gelek

şikeft hene, em herin bi wir va, heta sibê".
Wisan jî kirin.
Mirad, Rihan dabû ser milên xwe û bi çiya va hildikişiya. Hevalên wî li pêş çûn, cîhekî xweş dîtin û ew birine wir. Hevalên Mirad çûn giya çinîn, anîn Rihan danîne ser. Rihan xayis ketibû, Mirad got:
- Rihan, delaliya min, bêje, kêdera te diêşe? De bi min ra beber bide, ma tu dixwazî ez dîn bibim, Rihan!
Hingê wê çavên xwe nerm vekirin, li Mirad nihêrî û dîsan girtin. Zelxoya diya Mirad pêra pêra pêsîra wê vekir, ciyê birînê tije pêsû kir û careke din girêda. Wê di ber dilê Mirad da, got:
- Şikir tiştek tune, Rihana min dê di çend rojan da baş bibe.
Hevalêd Mirad jî dilminî didane ber dilê wî, ku tiştekî tirsê tune, birîna wê zêde kûr nîn e. Bala xwe danê êdî dinya zelal dibe, gotin:
- Mirad, em dê niha herin gund, binihêrin ka çi heye, çi tune.
Ew kî bûn êvarê bi pey me ketibûn? Êêvarê dîsan vegerin werin.
Bila tenê Rihan hebekî baş be, wekî din tişt nabe.
Herdu hevalên Mirad çûn. Mirad ji kêleka Rihanê ranebû. Wî bi destê wê yê mîna berfê qerqaş girtibû, miz dida. Lê Rihan hay ji xwe tunebû, wê carina dikir axîn û careke din bêdeng dibû.
Sibe rind safî bûbû, tava piştî baranê dabû û bîhna behiştê keti-
64

bû wan derdoran.
Zelxo ji şikeftê derket, ku binihêre ka ew li kur in, gelo gundekî nêz tune, ku here ji Rihanê ra dermanekî, tiştekî bîne, lê wê tu gund nedît.

Gava Mirad dît, ku ew tenê li bal Rihanê maye, destên wê da ser çavên xwe, ramûsa û deng lê kir, got:
- Rihan, Rihan emrê min, Rihana min, şêrîna min, çavên xwe yên reş veke, bila dinya min dîsan ronahî bibe!
Rihanê çavên xwe vekirin, li Mirad nihêrî. Lê tenê lêvên wê çûn û hatin, got:
- Mirad, tu li vir î? Ax... Çi baş e, ku tu li kêleka min î, ez ê bimirim! Lê dîsan jî tiştek nabe. Mirin ji mala Seydo Axa baştir e. Mirad, delalê min, azaddarê min, tu li ber xwe nekeve, ez êdî li bal te me, ez ya te me, ku bimirim jî dizanim ez êdî ya te me. Ez dixwazim ji te re bibêjim, ez bi libalbûna te gelek kêfxweş im. Tiştek jê baştir tune, ku meriv li bal heskiriyê xwe be... Min wisan dixwest, lê mirazê min nîvçe hiştin.
Mirad got:
- Rihan, wisan nebêje, tu dê sax bibî, em dê tim li bal hev bin. Delala min, ez dê bêî te dîn bibim.
Hêsir bi ser sûretê wê da hatin.
Hingê Zelxo bi pincara destê xwe ve hat û bi eşq got:
- Mirad, tu êdî çu fikran neke, ez dê Rihana xwe sax bikim. Tu rabe ji min ra agir dade.
Wî agir dada. Bi dilekî melûl û dilşikstî. Zelxo di şerbikê xwe da pincar keland û danî ser birîna Rihanê, ew birîna ku zêde ne kûr bû. Guleyê çerm qelişandibû û derbas bûbû.
Ber bi êvarê hevalên Mirad hatin. Gava Mirad ew ji dûr va dîtin, ber bi wan va çû, got:
- De lawikino bêjin, çi heye, çi tune?

Hingê, hevalên wî gotin, ku Seydo Axa gelek hêrs bûye; peyayên xwe şandiye ser hemû riyan, lê dîsan jî tu tişt nebihîstine.
Mirad pirsî, got:
- Peroya cariya wan xeber dabû wan?
Yekî got:
- Ew di mala Hesen da bûye, gava nihêriye, Rihan tune, çûye û ji Casim ra gotiye. Casim jî hemû peyayên xwe rakiriye û bi pey me ketine. Wexta di riya bal mezelan ra tên yek me dibîne, lê yek ji wan dibêje: "Ma çima ew dê ber bi mezelan va bên û li vir bisekinin? Ew niha wekî birûsk direvin". Yekî din jî dibêje: "Em agir bikin, heke ew bin dê bersiva agirê me bidin". Casim di pêş wan da ye, ew agir dike. Dinihêrin, ku em bersiva agirê wan nadin, dibêjin "kes li vir tune" û bi riyeka din va diçin.
Mirad dîsan pirsî, got:
- Ew niha texmîn nakin, ku em li ku ne?
Hevalên wî gotin:
- Na, ew nizanin. Loma jî rind nagerin. Heke Rihan hinek pak bû, sibê şeveqê rabin, bi rê bikevin û ji vir herin. Te hew dît hatin van deran, kî dizane?
Êdî gelek ji şevê derbas bûbû. Çavên Rinanê girtîbûn, lê hişyar bû, gotinên Mirad û yên hevalên wî dibihîst. Gava wan xeberdana xwe kuta kir, Rihanê çavên xwe vekirin, bi destê Mirad girt û nerm givaşt, got:
- Mirad, heke hûn ji bo min li vir sekinîne, naçin, hema niha karê xwe bikin û em herin. Ez baş im, rast e ez vê sibê pirr xerab bûm, lê niha piştî wî dermanî ez baş im. Ez dê bikaribim bêm, netirse. Ez dê heta şeveqê baştir bibim, em zû ji vir herin.
Gava Mirad ev gotin bihîstin, rihê wî teze bû, rih bi qudûmên

wî da hatin, bi eşq got:
- De wekî wisan e em dê sibê êvarê bi rê bikevin. Bila birîn hi-
66

nekî din jî bikewe. Wisan qerar girtin.
Wê şevê, Rihan rehettir raza. Ji sibê va karê xwe kirin, ku êvarê bi rê bikevin.
Hevalên Mirad dîsan çûbûne gund, dereng hatin. Gava Mirad çav bi wan ket gelek şa bû, li nav çavên wan nihêrî; wî dixwest tê derxe gelo tu qeza ne, qewimîne. Wan rewşa Mirad Fêm kir û bi ken gotinê:
- Mirad, qet nefikire, her tişt rind e. Tenê dimîne Rihan, ku Ri-han zû baş bibe û hûn zû ji vir bi rê bikevin. Seydo Axa û kurên xwe, xwe dikujin, lê nizanin bi ku da herin, bi kur va neçin. Gun-dî gişk di derheqa te da xeber didin û şa dibin, ku vê carê mirazê Seydo Axa nebû. Bila Seydo Axa jî bizanibe, ku gundî jî meriv in. Lê Mirad hûn çiqas zû ji vir herin ewqas baştir e.
Rihanê got:
- Hûn rast dibêjin. Çiqas zû be ew qas rind e. Ew niha bi şev jî li me digere. Em dê îşev bi rê bikevin.
Wisan jî kirin. Karê xwe kirin, Rihanê dida xuyakirin ku ew pirr baş e, lê ya rastî ew gelek diêşiya, lê ji bo xatirê Mirad dengê xwe nedikir. Gava ji şevê gelk bihurî, Mirad nêzîkî Rihanê bû û got:
- Rihan, rast bibêje, tu dikarî îro bi rê bikevî an na? Heke tu ni-karibî em dê îro jî bimînin.
Rihanê li Mirad nihêrî û bi ken got:
- Ez pak im. Ez zaf baş im. Tu netirse, ez namirim, tu tişt bi min

nayê, lew tu li bal min î. Niha tu kes êdî nikare me ji hev biqetîne, me ji hev dûr bike. Tu bixwazî em dikarin niha jî bi rê bikevin.
Mirad bi eşq rabû çû derve bal hevalên xwe, got:
- De hevalên min yê ezîz êdî wext nêzîk dibe, em bi rê bikevin.
Hesp anîn, Rihanê lê siwar kirin û befê xwe dane riya Tîblîsê. Mirad got:
67

- Hevalino, hûn êdî vegerin. Ez ji we pirr razî me, min ji bîr nekin.
Hingê yekî ji Mirad pirsî, got:
- Mirad, tu dizanî ku me çiqas ji te hes dikir? Em tim bi hev ra bûn, em tu caran te ji bîr nakin. Ev mêraniya ku te kir tiştekî mezin e, te ji me ra jî rê vekir.
Hevalên Mirad nêzî wî bûn, çûne dest û rûyên hev û xatir ji hev xwestin. Hingê yekî ji Mirad pirsî, got:
- Tu dê kengê bi aliyê me da bêyî?
Mirad got:
- Çaxê ku Seydo Axa tunebe...
Dîsan xatir ji hevalên xwe xwest û bi rê ket. Rihan û Mirad li ser hespê hev ramûsan. Zelxo ji kêfan nizanîbû çi bikira, li wan nihêrî û şad bû.
68

MIZGIN
Rojeke biharê ya xweş bû. Roj du bejin bilind bûbû. Tavê dabû deşt û baniyên ku ji dûr va wek xalîçeyên rengîn xuya dikirin. Aviya ku êvarê ketibû ser gul û sosinan hîn dibiriqî. Kalekala kar

û berxan, hokehoka şivan û berxvanan ji gund dihat. Li perê gund, ji dûr va dengê traktoran dihat. Bedîl û qîza wê Zînê vedigeriyane malê. Herdû jî di kolxozê de çêlekdoşên pêş bûn. Dê û qîz bi ken bi hev ra diaxivîn û ber bi malê dihatin. Ji nişka va nihêrtin ku kurê cînarê wan Mecîd wa ber bi wan direve û dike gazî:

- Xatiya Bedîl, Zînê... mizgîniya min... Selîm hatiye!

Gava dê û qîzê navê Selîm bihîstin, dinya wan ronahî bû. Ber bi malê bezîn. Zînê berî diya xwe giha malê, birê xwe hemêz kir, ramûsa û got:

- Birê min î şêrîn, perrên min, min çiqas bêriya te kiribû...

Wê digot û birê xwe radimûsa. Selîm jî xuwîşka xwe radimûsa. Gava Bedîl gihîşte malê, kurê xwe hemêz kir, da ber dilê xwe. Ji şabûna hêsir ji çavên wê dibarîn. Paşê dê û kur li kêleka hev rûniştin. Xwîşk û birayên Selîm lê civiyabûn û ji xwe ra şa dibûn. Paşê wî ji diya xwe pirsî, got:

- Dayê, Tahir çawan e, ew dê kengê bê?

Diya wî got:

- Kurê min, wî ji min ra nivîsîbû, ku dê îmtîhanên xwe xelas bike û bê.

Di wê demê da çend cînar ji der da hatin, çavronahî dane Bedîlê û eniya Selîm maçî kirin. Ew hê rûneniştibûn, merivekî bejinbilind

69

û beşerxweş ber bi wan va hat. Yekî pirr kesirî bû. Serokê kolxozê Yûsivê Xeto bû, got:

- Siba we bi xêr! Çavên we bi ronî!

Paşê nêzîkî Selîm bû, çû eniya wî, qasekî li wî nihêrî, simbêlê

xwe bada û got:
- Maşela... Selîm maşela! Tu di nav du salan da çiqas hatî gu-
hastin? Tu çiqas tijî bûyî, çiqas bedew bûyî, weleh Kawê te bibîne
qet nas nake. Selîm sar bû, serê xwe kire ber xwe. Yûsiv lê nihêrî,
ku Selîm şerm dike, gotina xwe guherî û jê pirsî, got:
- Lê tu çawan awa zû hatî?
Yûsiv li hêviya bersiva wî bû. Selîm got:
- Hevalê Yûsiv, bi qerarê hikumetê pirr leşker ji wextê xwe zû-
tir vegeriyane mal. Yek ji wan jî ez im.
Wisan got û bi ken li Yûsiv nihêrî.
Bedîlê ku navê Kawê bihîst, bi eşq li kurê xwe nihêrî û got:
- Erê, erê rast e, wele bibexşîne min ev yek ji bîr kiribû. Ez qur-
bana te û destgirtiya te bim, tu çira şerm dikî? Kawê qîzeke delal
û bedew e, bi namûs e... Heta niha hîn tu kesê gund negotiye wê
ev şaşî kiriye.
Hingê Yûsiv got:
- Erê welle, li ser bextê min Kawê qîzeka hêja ye, jîr e, nolî pi-
rîskê ye. Gava tê dest bi karê xwe dike, hewes û heşmetkariya me-
riv pêra tê. Ew dê wek çêlekdoşa pêşîn bi Zînê ra here Moskova-
yê.
Gava Selîm navê Zînê bihîst, pêra pêra li xwîşka xwe vegeriya û
gotê:
- Xuşka min ya delal, ez bi destanên te zaf kêfxweş dibûm.
Wan wisan bi hev ra xeberdan dikir, Bedîlê hahaka texte rast
kir, kas tijî kirin. Yûsiv li xelkê dinihêrî û got:
- Ez vê kasê ji eşqa mala we vedixwim, berî herkesî ji eşqa xwîş-
70

ka Bedîlê; ya ku deh zaro terbiye kirine. Deh zaro ne tiştekî henek e, meriv xwedî bike, mezin bike û hikumeta Sovyetê zaf rast gotiye, ku navê wê daniye "Diya Mêrxasan". Yûsiv kasa xwe bi ser xwe da kir, xatir ji wan xwest û derket, lê hema ji ber derî vegeriya û gote Selîm:

- Selîm, sibê were cem min da ez traktora te dîsan teslîmî te bikim. Selîm şa bû û ji serokê kolxozê re spas kir.

Selîm wê rojê heta êvarê deqeyekê ji malê derneket. Lew meriv û pismamên wî dihatine cem; yek radibû yek rûdinişt.

Selîm êvarê dereng raza. Lê gelo ew raza? Na, ew di nav ciyê xwe da difikirî. Ew difikirî, ku ew dê dîsan li ser traktora xwe bixebite û di derheqa Kawê da difikirî. Ew şa dibû, bêsebir bû, li benda şeveqê bû.

Ew bi vî awayî heta berbanga sibê hişyar ma. Lê xewa berbangê lê zor kir, çavên wî yên reş giran bûn, hatine girtin. Lê piştî saetekê ew careke mayîn hişyar bû. Wî li derva nihêrî û dilê wî ji şabûnê lêxist. Gava texmîn kir, ku êdî sibe ye, rabû kincên xwe li xwe kir; pêşgîr û sabûn hilda çû ser kaniyê. Gava ew derketibû derva kesek tunebû, lê bi rê da qîz û bûkên gund rastî wî dihatin, ji kaniyê dihatin. Wî çavên xwe li Kawê digerand.

Ew çû li ber kaniyê rûnişt, destên xwe bi ava sar î wek qeşemê şûşt. Paşê hinek ava sar vexwar. Di wê demê da bû xişexişa çayirê, dengê lingan ji pişt wî va hat. Li pişt xwe zivirî, bû mîna risas, reşeşevî bi ber çavên wî va hat; ling lê sist bûn, dest lê lerizîn. Qîzeke delal, Kawêya bejinzirav û çavreş ber bi wî dihat. Guliyên dirêj kiribû du kit û mîna marên reş bi navmila nazik da berda bû. Ew bi deng bi hevala xwe ra dikeniya. Diranên qerqaş nolî sedef dihatine kivşê. Te dê bigota gul û nûr lê dibarin. Gava ew nêzîkî

kaniyê bûn, wê Selîm dît û kire îskînî, di cîh da ma. Gava Selîm ev yek dît ber bi wê çû û bi destê wê girt. . .
7i

WEŞANÊN NÛDEMÊ
BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCl Celadet AB Bedir-Xan / Gramer
DÊODEMARlEgîdêXudo /Roman
KESKESOR Nûredîn Zaza / Çîrok
DI FOLKLORA KURDl DE SERDESTIYEKE JINAN Rohat / Lêkolîn
HEZ 0 BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Ceribandin
MÎRZA MEHEMED Medenî Ferho / Roman
MILKÊ EVlNÊ Rojen Bamas / Şiîr
ZAROKA ŞEVÊ Jack London Wergen Mustafa Aydogan / Çîrok
BIYANl Afcert Camus Wergen Fawaz Husên / Roman
MÎRZAYÊ BIÇOK A. de Saim-Eksupêry Wergen Fawaz Husên / Çîrok
GOTIN Yajar Kaya / Ceribandin
ANTOLOJIYA 0ROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛRXelîl Duhokî
ŞEVÊN SPl Dostoyevskî Wergen Firat Ceweri / Roman
MIŞK 0 MIROV John Steinbeck Wergen Firat Ceweri / Roman
BEXÇEYÊ VÎŞNE Çexov Werger Firat Ceweri / Piyes
Firat Ceweri / Piyes
LI BENDA GODOT Samuel Becket Werger:
GOTINEN NAVDARAN Amadekan Firat Cewerî / Aforîsma
GIRTÎ Firat Ceweri / Çîrok
KEVOKA SPl Firat Ceweri / Çîrok
KULTUR, HUNER 0 EDEBIYAT Firat Ceweri / aribandin, hevpeyvîn
XEZAL Sîma Semend / Çîrok
EVÎNA REBEN Derwej M. Ferho / Şiîr

BANGA HAWARÊ Medenî Ferho / Şiîr
KULTUR 0 RAMAN Şerefiran Cizîri / Ceribandin
KURÊ ZINARE SERBILIND Sidqî Hiroiî / Roman
DERWARl Yusufê Cerihî / Şiîr

Semend di sala 1933'an de lı
Sîma
navçeya Axbaranê (Sovyeta kevin) hatiye
dinyayê, di sala 1958'an de fakulteya
filolojiyê li unîversîteya Êrêvanê xelas
kiriye û paşê bûye redaktora beşa kurdî ya
radyoya Êrêvanê. Ew heta niha jî di wî
karê xwe de dixebite.
Sîma Semend bi prosayê dest bi
nivîskariyê kiriye û nivîskariya xwe bi
prosayê jî berdewam dike. Wê heta niha
du pirtûkên çîrokan nivîsandiye û di anto-
lojiyan de jî cih girtiye. Weşanxaneya me
Xezal ku cara pêşî di sala 1961'ê de bi
tîpên krî1î li Êrêvanê hatibû weşandin, bi
niyeta teşwîq kirina keç û jinên kurd, bi
serbilindî
pêşkêşî pirtûkxaneya
kurdî
dike.
Weşanên Nûdemê

ZAROKA ŞEVÊ

Jack London
Çîrok
Werger: Mustafa Aydogan
Weşanên NÛDEM

Weşanên NÛDEM: 16
Zaroka Şevê
Çapa Yekem: Stockholm 1995
© Mafê kurdiya wê: Weşanên NÛDEM
Pergala berg û rûpelan: NÛDEM
Wêneya bergê: Karanî Jamîl,
ji kovara Svensk-Kurdisk Journal
ISBN: 91 88592-16 2
Navnîşan:
Termov. 52 2tr.
17$ 77 Jarfölla-Sweden
Tel û Fax: 8-58356468

Naverok
Zaroka Şevê 9
Xwêdana Eniyê 7.6
YêMeksîkî 50

JACKLONDON
(1876 - 1916)
Di dawiya sedsala 19-an û di destpêka sedsala 20-an de, hem li dinyayê û
hem jî li Amerîkayê gellek guherrin çêbûn. Mirovatî ji qonaxekê derbasî

yeka din dibû. Di pêvajoya vê derbasbûnê de, pêşveçûnên ku di warê teknolojiyê de hatin holê û guhertinan tesîr li têkiliyên mirovan kirin û ji nû ve şikil dan wan, bi gellek awayan harin zimên. Edebiyat jî li hember van guherrinan nikarîbû laqayt bima. Xwendevan di nava rûpelên berhemên nivîskarên wê demê de, xusûsiyetên wê demê û manzarayên însanên wê demê ji nû ve dijîn.

Jack London jî yek ji wan nivîskarên ku damga xwe li dawiya sedsala 19-an û destpêka sedsala 20-an xisrine, ye. Belkî nivîskarê herî produkrîv û yê

ku behsa wî herî bêrir tê kirin, be jî. Di wê demê de, kêm nivîskaran bi qasî wî tesîr li civakê kirine. Li gel ta'ma xwendina nivîsên wî, enteresantbûna jiyana wî jî bala mirov dikşîne. London ne bi tenê di nava xwendevanên edebiyatê de tê nas kirin. Ew mirovekî pirralî bû. Di nava hemû alîyên vê pirralîbûna wî de, ji aliyê şiyana nivîsandinê ve ahengeke pirr baş hebû. Lê ji bo naskirina London, lêhûrbûna jiyana wî ya zaroktiyê şert e. Bêî vê yekê, fahmkirina wî û nivîsên wî, dê pirr zehmet be. Ger mirov bibêje; hema hema hemû pirtûkên wî yên edebî, li ser bingehê wan hedîseyên ku ew bûye şahidê wan, an jî yên ku ew bi xwe jiyane, hatine avakirin, dê ne mubalaxe be. Bo numûne di "Xwêdana Eniyê" de xusûsiyetên zaroktiya London bi awakî pirr vekirî xuya dibin. Ji bo ku bibe yê herî xurt, yê herî pêş û yê herî bilind bi awakî nedîtî xebitî. Ji bo xwe di her warî de bi mirovan bide qebûlkirin û mirov li hember van xusûsiyetan serê xwe bi-

tewîne, çi ji destî wî dihat texsîr nedikir. Ev daxwaza û hewildanên ji bo pêkanîna van daxwazan, di jiyana wî de, di danûstendin û helwestên wî yên li hember mirovan de tesîreke gellek mezin kir. Di kîjan grûpê de ba, bila biba, wî hertim dixwest ku ew bibe yê sereke. Ev di pirtûkên wî de, di

xusûsiyetên qehremanên wî de, tê dîrin. Ger hûn Londonê ku hertim digot; "Zarokriya min qet çênebû", Johnnyê "Xwêdana Eniyê" yê ku di kar de nedixwest tu kes bighêjê û qet tu zaroktî nejiya, tîne bîra mirov.
Di pirtûkên wî de heyecaneke mezin heye. Heyecan û hêviyên qehre-

manên pirtûkan, bi zimanê London ê ku diherike û bûyeran bêrir enteresan dike ve xwendevanan bi temamî dixin seha xwe ya magnetîk. Ev xusûsiyet meraqa xwendevanan û heyecana ku di berhemê de heye, tev li hev-
dû dike. Xwendevanên ku pistî dest bi xwendina pirtûkeke wî dikin, êdî ne bi destên xwe ne. Heta ku pirtûk biqede, nema dikarin dev jê berdin.
Rasriya civakê û protestoya li hember şertên jiyanê, bingeha nivîsên wî bû. Lê wî hemû hêlên vê rastiyê, di bin ronahiya zanyariya edebiyatê de, dianî ba hevdû; heyecan û hîsên xwe tevê dikirê: ew bi hemû şiyana xwe ya hunerî disrira; bi îdealên xwe yên pêşerojê ve dihûna û pişrî gîhastina qonaxa yêkîtiya dîyalektîk ya di navbera estetîk û rastiyê de, ji nû ve pêşkê-
şî civakê dikir. Ji ber vê yekê, London wî cîhê xwe yê ku di dilê xwendevanên edebiyatê de hatibû peydekirin hîn jî diparêze.
Min li jor diyar lrir ku London nivîskareld pirralî bû û di nava vê pirralîbûna wî de ji aliyê şiyana nivîsandinê ve ahengek hebû, lê divê lê bête zê-
delririn ku ev aheng di warê fikrî de cîhê xwe ji dijayetiyan re dihêle. Ji ber
vê yekê ew nivîskarekî bi şiyan, lê bi paradoksan ve hilmiştî tê dîtin. Li gor gellek lêkolîneran fikrên wî ji tevliheviyeke Marks û Nietzche pêk dihat.
Sosyalîzm, neteweperestî, elîtîzm, nîjadperesti... Wî hertim weha digot; "

Ez berê sipî mim û dû re sosyalîst im". Vê helwesta wî carinan serê wî di-
xist belayê jî. Bo numûne; ji nîjada zer nefreteke mezin dikir. Gava li Ja-
ponyayê bû, ji ber vê nefreta xwe di munaqeşeyekê de li yekî Japonî dixe
û
tê girtin. Ger serokê Dewletên Amerîkayê yên Yekbûyî Roosevelt mudaxe-
le nekira, ew ê bi şertê ku divê Japonyayê terk bike jî nehata berdan. Para-
doksa di warê fikrî de hebû, bi Şerrê Cîhanê yê yekem re, giraniya xwe da
aliyelrî. Di Şerrê Cîhanê yê yekem de, hêla wî ya neteweperesti pirr eşkere
bû. Wî di vî şerrî de bi awakî neteweperest pijtgiriya Amerîkayê kir û dû
re jî têkiliyên xwe ji Partiya Sosyalîst birrî. Lê bi paradoksan ve hilmiştîbû-
na wî, di îstifanameya wî de jî xuya dibû; wî di îstîfanameya xwe de dîsa
prensîpên sosyalîzmê paraztibû.
London di 12.01.1876-an de, li San Fransisco hatiye dinyayê. Ew, berhe-
mê wê têkiliya bi dtzî ya dîya xwe (Flora Wellman) û bavê xwe (astrobgê
îrlandî William Chaney) bû. Gava hîn ew di zikê dîya xwe de bû, astrolo-
gê îrlandî ji San Fransisco diçe û nema vedigere. Piştî ku Jack dibe neh-
mehî, dîya wî bi John London re dizewice. Jack li ba vê malbatê mezin di-
be. Ji xwe paşnavê xwe, yanî LONDON jî ji vê malbata zirbavê xwe sten-
diye.
London xwedî jiyaneke zarokrî ya pirr enteresant bûye. Zarokrîya wî di

feqîriyê de derbas bûye. Ji ber vê yekê jî London di temenekî pirr piçûk
de, dest bi jiyana kar kiriye. Wî ji rojname firotinê, ji kovboytîyê, ji lizêr-
gerînê, ji di fabrîkeyan de karkirinê, ji serserîriyê û hwd heta di 1904-
1905-

an de, korrespondenriya herba Rûsya û Japonyayê, tu kar nema ku nekiri-
ye. London gelek celeb mirov nas kir û li gelek jîngehên cûda jiya. Jiyane-
ke bûyerzengîn û enteressant... Nivîsên wî, li ser vê jiyana bûyerzengîn û enteressant harin ava kirin û bûn zimanê protestoya li hember neheqiyê...
Ji ber vê jî tev paradoksên wî yên di warê fikrî de hebûn jî ew dîsa wek ni-
vîskarê xebatkaran tê nas kirin.
Nivîskariya wî bi saya musabaqeyeke kovara bi navê "San Fransisco
Morning CalTê dest pê dike. London wê gavê 17 salî bû. Bi çîrokeke xwe
ya ku li ser bingehê bîranînên deryayê hatibû avakirin, beşdarî wê musabe-
qeyê dibe û 25 dollarê xelata yekem werdigre. Çîroka wî di 12-ê Mijdara
1893-an de di Callê de tê weşandin. Pişrî vê bûyerê, biryara nivîskariyê di-
de. Çend çîrokên din jî dinivîsîne, lê wê gavê bi sernakeve û hêviyên wî
yên di vî warî de hebûn jî qels dibin.
Londonê ku xwe biserneketî dihesiband di nava bêhuzûriyeke mezin de
bû, tam di wê navê de Rêxisrina bêkaran "Coxey" bi ordiyeke bêkaran ku
gellek ji wan sendîkavan bûn, ji bo hin daxwazan, berê xwe dabû Qesra
Sipî. London jî bi hevalekî xwe re da dû şopa vê rêxistinê. Di vê rêwîtiyê
de bû şahidê munaqeşeyên pirsên civakî û siyasî. di bin tesîra wan kesên
ku di derheqa Marks, Engels, Darwîn, Nierzche û hwd gellek tişt dizanî-
bûn de ma. Ji ber vê tesîrê gava vegeriya malê, tev li ku 19 salî jî bû, li Lîse-
ya Oaklandê dest bi xwendinê dike. Beşdariya civînên Parriya Karkir a
Sosyalîst jî wê demê dest pê dike. Jack Londonê ku ku bi agirê xwendinê
dikeliya di 1896-an de dest bi Unîversîteya Berkeley dike, lê li wira ancax

salekê diqedîne, dû re dev ji xwendina unîversîteyê ber dide û nema lê ve-
digere.
Ji bo peydekirina zêran, wî jî wek gellek kesên wê demê berê xwe da Klondikeyê. Wê demê Alaska bi temamî di bin êrîşa zêrgerokan de mabû. Di vê gerrê de hem hêviyên dewlemendbûnê û hem jî heyecaneke pirr mezin hebû. Londonê ku ji macerayê pirr hez dilrir jî beşdarî vî karwanî bû û berê xwe da Klondîkeyê. London di vê gerrê de dîrhemeke zêr jî ne-
dîribû, lê serpêhatiyên ku di pêvajoya êrîşa zêran de hatibûn jiyîn, tistên ku ew di pêvajoyê de bûbûn sahid, bi serpêhariyên wî yên zaroktî re ew bi
bingeheke xurt ve li nivîsandinê sor kir. Ew munaqeşeyên li Klondîkeyê di pêvajoya ku ew li zêran digeriyan de, tesîreke mezin li fikrên wî yên ku di

warê sosyalîzmê de hebûn, kir. Londonê ku dîrhemeke zêr jî peyde nekiri-
bû, dû re bi saya sefêra Klondîkeyê bi awayekî din dewiemend bû. Lê tev vê dewlemendbûnê jî ji ber fêrbûna xwe ya pirr pere xerckirinê, gava mir jî
deyndar bû.
London pişrî vegera ji Klondîkeyê, bi awakî pirr cidî dest bi xebata ni-
vîskariyê kir. Hinek îddîa dikin ku ger London neçûba Klondîkeyê, ew ê nebûya nivîskarelrî navdar. Bi rastî jî tev li ku bi wê musabeqeya kovarê dest bi nivîskariyê kiribû jî çi bû pisrî 1898 -an bû, yanî pisrî ku ew ji Klondîkeyê vegeriya. Wê demê li Califbrniyayê gellek kovaran ji bo wer-
girrina çîrokên wî di ber hevdû de dan. Ji wê rojê û pê ve, rojê hezar gotin nivîsand û ev prensîp heta mirinê qet xera nekir. Pirtûka wî ya yekem bi navê "Lawê Gur" di 1900-î de ket destên xwendevanan. Ev prensîp hişt ku

ew bibe yek ji wan nivîskarên herî produktîv. Di navbera 16 salan de li ser hevdû 49 pirtûk nivîsand. Ji vê tê fahmkirin ku wî salê bi kêmanî 3 pirtûk weşandine.
Jack London di şeva 21.11.1916-an de, ji ber nexweşiya xwe di nava nivî-nê xwe de bû. Bi jev, ji dermanên ku doktor dabûnê dozajeke zêde xwar û
roja din çavên xwe bi yekcarî girt. Li gor hinekan sebeba mirina wî, bêdî-qerî bû. Lê li gor hinekî din jî wî bi zanebûn weha kiribû û bi vî awayî qe-dera Martin Eden taqîp kiribû. Gava ku London çavên xwe girt çil salî bû. Wî çil salên xwe qedand, lê ew tev paradoksên xwe yên fikrî jî bi 49 pirtûk (wek Pahniya hesinî-1907, Martin Eden-1909, Qêrîna Wahşetê-1903, Berî
Adem-1906, Şampiyon, GeUyê heyvê, Berxwedan, Agir dadan, Kûçikê Sîr-kê û hwd) û gotarên xwe yên bêhejmar ên ku wî li dû xwe hiştin, di din-yaya edebiyatê de, jiyana xwe didomîne.
Jack London ji nava dilê gel û ji kûrahiya civakê dest pê kir, bilind bû, gîhaşt serê keleha dhana edebiyatê û di çapa dinyayê de, bû nivîskarekî navdar... Ew berhemê Amerîkaya wê çaxê bû. Berhemên wî, hem eyna ci-
vaka wê demê û guherrinên ku bûn bingehên pêşveçûnê ne û hem jî şahi-dê pêvajoya ji sedsala 19-an derbasî sedsala 20-an bûyinê ne.
Mustafa Aydogan

ZAROKAŞEVÊ
Em li wê klûba kevn a Alta Inyoyê bûn. ji bo Sanfransiscoyê şeveke germ bû û di pencereyên vekirî re girregirr û xircira kolanan ji dûr ve û bi awakî lawaz derbasî hundur dibû. Şevbuhêrk ji daweya ruş-wetê, ji nîşanên ku serkariya bajêr dê ji karên tarî bête paqijkirinê,

hat ser hemû rezalet û rizandina ecêb, hemû awayên dijminatî û basîttiya mirovan. Heta ku navê O'Brien derbas bû, weha dom kir. O'Brien ew boksorê xort yê pêşerojeke rohnî li ber wî xuya dibû ku di wê maça bi xelat ya do bi şev de, hat kuştin. Hewa ji nişka ve paqijtir hat hîskirin. O'Brien xortekî bi îdeal û xwedî jiyaneke pirr paqij bû. Wî ne araq vedixwar, ne çixare dikşand û ne jî sixêf dikir; laşê wî mîna laşê xwedêyekî ciwan bû. Pirtûka xwe ya duayê heta ber qiraxa rîngê, bi xwe re dibir. Dû re li odeya kincguhertinê, ew di bêrîka çakêtê wî de dîtin.
Li vir xortaniyeke paqij, bi sihet, bê leke, serkevtin û mucîzeyên di xeyala wan mirovên ku ew wenda kirine û bûne navosere de hebûn, diyar dibû. 0 me ewqasî xeyal kir ku ew romantîzm hat û me ji civata mirovan û ji talûke û stresa wê, bi qasî saetekê bi dûr ve xist. Ev hewa bi saya ku Bardwell peyveke Thoreau anî zimên, dest pê kir. Lê di eslê xwe de, yê ku ruh û can da vê saeta romantîk, Trefethanê kal ê serrût û bi gerden bû. Wî peyv ji Bardwell wergirt û dewam kir. Belkî me di destpêkê de, meraq dikir bê gelo wî ji şîvê û heta nuha çend Skotch vexwariye, lê ev pirr zû hat jibîrkirin.
Trefethan got;
"Di sala 1898-an de bû. Ez wê gavê sîh û pênc salî bûm. Belê, ez dizanim ku hun nuha temenê min dihesibînin. Heqê we heye. Ez nuha çil û heft salî me, lê ez bi qasî deh salan kaltir xuya dikim.

Doktor dibêjin... biJa qe, xwedê bela doktoran bide!"
Ji bo ku hêrsbûna xwe hebekî daxîne, qedeha xwe ya dirêj ber bi lêvên xwe ve bilind kir û hêdîka gulpek jê vexwar û got;
"Lê ez wê çaxê xort bûm. Ez beriya nuha bi duwanzdeh salan xort bûm. Por bi serê min ve hebû û zikê min jî bi qasî yê adêtekî

dûz bû. Roja herî dirêj jî ji bo min ewqas dirêj nedihat xuyakirin. Lê ez di sala 98-an de pirr xurt bûm. Milner, ez têm bîra te. Te wê gavê ez nas dikirim. Ma ez ne bê qusûr bûm?"
Milner gotinên wî, bi serê xwe kilkirinê ve tesdîq kir. Ew jî mîna Trefethan muhendîsê madenê bû û li Klondikeyê dewlemend bû-bû.
Milner got;
"Belê, tu weha bû, kalo. Ez wê şeva ku wî rojnamevanê hûrik şerr derxist û te wan darvaniyan hemû da ber xwe, qet ji bîr nakim. Slavin wê gavê li gund bû û menajerê wî dixwest bi Trefethan re maçekê li dar bixe. "
Trefethan bi hêrs got;
"Hey, li min binihêrin! Goldsteadê li min weha kir. Xwedê dizane bê çend milyonên min hene, lê di ruhê min de tu tişt nemaye û... di rehên min de jî. Xwîna sor a qenc çû. Ez mîna pîşemasî mim, lodeke protoplazmayê ya pirr qelew û laşgiran, mîna... mîna...
Lê gotina xwe neqedand û ji qedeha xwe ya dirêj gulpeke teselliyê vexwar.
" Di wê demê de... jinan li min dinihêrîn; dû re ji bo ku dîsa li min binihêrin, di ser situyên xwe re dizîvirîn. Pirr ecêb e ku ez tu carî ne zewicî mim. Lê ew keçik... min ê ji we re behsa wê bikira. Ez bi qasî hezar mîlan dûrî deverekê, li wê rast hatim. Dû re em hîn bi dûrtir çûn. Wê ji min re ew gotinên Thoreau yên ku Bardwall bîstikeke berê anî zimên, xwend; di derheqa xwedêyên bi roj çêbûne û yên bi şev çêbûne, xwedêyên sipî û yên reşik.
Piştî bicîhbûna min a li Goldsteadê bû. Min wê gavê nizanîbû bê
10

ew çem kaniya xizneyeke çi mezin e. Min ber bi zinarên rojhilat ve dest bi wê rêwîtiyê kiribû. Zinar ji Gola Êsîran a mezin dest pê dikirih. Ew ber bi bakur ve, ne bi tenê pişta çiyê ne; sînorek e, xeta ku rê dibire, dîwarê ku mirov nikare rapelikê û fetih bike, ne. Ji bo derbasbûnê, tu rê peyde nabe. Di zemanê berê de, gerrok di wir re derbas bûne, lê hejmara kesên ku wenda bûne ji yên derbas bûne bêtir in. Min jî herî pirr, ji ber vê yekê, dest bi vî karî kiribû. Kî dibe bila bibe, ev sefer, seferek e ku mirov dikarîbû pê bipesiniya, bû. Ez nuha jî, ji nav wan hemû tiştên ku min kirine, bêtir bi vê dipesinim.

Ew dever erdekî nenas e. Di warê zîvronekên wê yên mezin de, tu carî lêkolîn çênebûne. Li wê derê, geliyên mezin ên ku hîn mirovên sipî pê li erdên wan nekirine, hene. Qebîleyên Cermsoran jî hema hema mîna deh hezar sal berê, paşdemayî ne, lê dîsa jî bi mirovên sipî re hinek pêywendiyên wan çêbûne. Carinan ji bo malbihevdêguhertinê, hinek mirovên sipî tên ba wan, hemû têkilî ewqas in. Heta Şîrketa Hudson Bay jî xwe nikarîbû bigîhanda wî erdî û çandinî lê bikira.

Vêca em bên ser meseleya keçikê. Ez ji cobarekî ber bi jor ve hildikişiyam. Hûn li Kaliforniyayê jê re dibêjin rûbar; ne nexşeya wî hatiye derxistin û ne jî navê wî hatiye danîn. Geliyekî esîl bû. Mirov gava lê dinihêre, dibîne ku li aliyekî bi dîwarên kanyonan ve tête girtin, li aliyê din ve, bi deştên muhteşem û fireh vedibe û li ber çavên mirov tê raxistin. Li wê derê, gîhayên bi qasî bejnekê dirêj, mêrgên bi kulîlkan ve xemilî, rêlên daristanên ladînan yên bakîre ûmuhteşem. Barên kûçikan giran bûn. Lingên wan tev birîn bûbûn û ew pirr westiyabûn. Ji bo bi berfa nû re domandina rêwîtiyê, bi

hêviya peydekirina ajoger û taxokan, ez li grûpeke çermsoran dige-
riyam. Dawiya payizî bû, lê hebûna kulîlkan ez ecêbmayî hiştim.
Min nêzîkayî li devera qeşagirtî kiribû û ez di nav qûntarên zinaran
re bilind bûbûm. Lê dîsa jî li ber min erdekî bê ser û bin ê bi kulîl-
kan ve xemilandî, hebû. Wê rojekê koçerên çermsipî xwe bighînin
ii

wê derê ûgenim lê biçînin.
Min dixanek dît û di pê wê re dengên kûçikan bihîst; kûçikên
çermsoran, dihatin kampê. Bi qasî pêncsed çermsorên muhterem
bûn. Ji goştên perçekiiî, weha xuya bû ku nêçîra payizî pirr baş der-
ketibû. Dû re min keçik dît- Lucy. Navê wê weha bû. Me bi tenê
bi îşaretan dikarîbû ji hevdû fahm bikira. Min ber bi bereqeya me-
zin- hun dizanin, konekî ku nêviyê wî ber bi agirê kampê ve vekirî-
ve birin. Ev kon bi temamî ji çermê gakoviyan bû. Çermên gakovi-
yan yên ku rengê wan qehweyîyekî zêrînî ku hatibûn dûdayîkirin û
bi destan ve hatibûn dlakirin. Hemû tiştên ku di bin wî konî de
bûn, bi qasî ku di tu konekî çermsoran de nedihat dîtin, bi rêk û
pêk û paqij bûn. Cîh li ser guliyên teze yên ladînan hatibû danîn.
Gellek kurk hebûn. Li ser kurkan jî xeftanek ji çermê qubeqazan
hebû ku min berê tu tiştekî weha nêdîtibû. Li serê nivînan, Lucy bi
çarmêrkî rûniştibû. Çermê wê rengê qahweyî yê bihîvan bû. Ama-
zonek ji xwîna esîl û xwediyê laşekî dagirtî bû. Çavên wê şîn bû.
Yên ku dest û lingên min li hevdû gerand jî ev bûn - çavên wê-
şîn, ne şînê porselenan, lê şîneke tarî, mîna ku derya û ezman tev li
hevdû bûne û pirr bi aqil. Wekî din jî dikeniyan, kenekî germ, ger-
meke tavê û mirovî, pirr mirovî û ... ma ez bibêjim pîrekî? Belê we-
ha bûn. Ev çavên jinekê bûn, çavên jineke heqîqî. Hun dizanin bê

êz dbcazim çi bibêjim, ma ez hîn bibêjim? Di van çavan de di eynî wextê de bê aramiyeke dijwar, hesreteke kûr û aramî, aramiyeke mutlaq, awayekî aramiya zanetî û felsefî hebû.
Trefethan ji nişka ve rawestiya.
- Hun dibêjin belkî ez serxweş im, ne weha? Lê ez ne serxweş im. Ji xwarinê û vir de, ev qedeha min a pênca ye. Hişê min li serê min e. Ez li vê dera hanê, li kêleka xortaniya xwe ya pîroz rûniştî mim. Yê ku dipeyive, ne Trefethanê "kal" e, xortaniya min e û xortaniya min dibêje ku ev çav, çavên herî xweşik ên ku min heta nuha dîtinin, weha aram, weha bê huzûr; weha zana, weha bi meraq; weha pîr, weha ciwan; weha tatmînkar û weha bi hesretê ve hilmiştî. Gelî 12.

zilaman, ez nikarim wan taswîr bikim. Gava ku ez behsa keçikê bikim, hun ê baştir tê bigihêjin.
Ew ranebû ser xwe. Lê destê xwe dirêjî min kir û got; " Biyaniyo, ez bi dîtina te pirr şa bûm." Êdî hun bifikirin, zimanekî weha! Hun dikarin hîsên min texmîn bikin. Ew jinek bû, jineke sipî. Lê ew ziman! Hebûna jineke sipî li vê derê, li sînorê herî dawî yê dinyayê, mirov ecêbmayî dihişt, lê ew ziman! Ew deng dikira guhên min qul bikirana. Mîna notayeke zirav ku ji jora perdeyê dihat lêxistin, bû. Lê tev vê jî ez dikarim bibêjim ku ew helbestvanek bû. Hun ê nuha bibînin. Xwecîh derxistin derve. Wan jî bi ya wê kirin. Wan emir ji wê distendin û bi temamî îtaetî emirê wê dikirin. Ew Hi-yu skookum bû, serok bû. Wê ji xwecîhan re got ku divê ew ji bo min çadirekê amade bikin û li kûçikên min binihêrin. Wan jî wek wê kir. 0 wan ew bi qasî ku cesaret nekin ku ji nav alavên min rahêlin qayişeke sixtiyan, nas dikirin. Ew kesek e ku divê hertim îataet jê re

bihata kirin, bû. Vê rewşê di laşê min de, ricifandinek e ku min di hestiyê xwe de û di mejiyê hestiyê xwe de hîs kir, peyde kir. Ricifandin di sitûna pişta min re heta jêr çû û hat. Li aliyê din î welatê ne tu kesî, bi qasî hezar mîlî dûrî vira, mirov li jineke sipî rast bê ku seroka qebîleyeke hov e.
Wê ji min re got; "Biyaniyo, ji te heye, çermsipiyê ku cara yekem pê li erdê vî gelîyî kiriye, tu yî. Rûnê û bipeyive, em ê dû re tiştinan bixwin. Tu ji kî derê tê yî?"
Dîsa ew dengê hanê. Ancax ez dixwazim ku hun ji vir û heta dawiya çîrokê, vê ji bîr bikin. Min ji bîr kiribû. Ez li wê derê, li kêleka xeftanê ji çermê qubeqazan bû, rûniştibûm û min li pîreka şehane ya di nava rûpelên pirtûkên Thoreau an pirtûkên hinekî din de derdiket, dinihêrî û li wê guhdar dikir.
Ez li wira, li ser daxwaza wê, hefteyekê mam. Wê hem ji bo peydekirina kûçikan û taxokê, hem jî ji bo ku xwecîh min bi qasî pêncsed mîlî di nava zinaran de, di zaboqên herî baş re derbas bikin, soz da min. Çadira wê dûrî yên wan û li perê bilind ê çem hatibû vegir-
13

tin. Çend keçikên xwecîh jî xwarina wê çêdikirin û karên kampê dikirin. Em peyivîn û peyivîn. Heta ku berfa yekem ket û ji bo taxokên min erd musaît bû, em peyivîn. Ev çîroka wê bû.
Ew li nêzî sînor hatibû dinyayê. Ji koçerên feqîr bû. Hûn dizanin bê ev tê çi maneyê; kar, kar, hertim kar, karekî pirr û tu carî naqede.
Wê got; " Min xweşbûna dinyayê qet nedîtiye. Wextê min tunebû. Min dizanîbû ku ew li derve, li deverekê, li dora qulûbeyê ye, lê diviyabû nan bihata lêxistin, paqijkirin, şuştin, kar qet nediqediyan.

Min carinan di dereceya nexweşiyê de dixwest ji hemû karan xelas bibim ûxwe biavêjim derve û tew di biharî de dengê çivîkan hişê min ji serê min dibirin. Ji bo ku ez bikaribim derûdora xwe têr bibînim, min dixwest tev lingên xwe yên ji xunavê şilbûyî, di nava gîhayên bilind re baz bidim, xwe di ser çeperan re biavêjim, daristanan li dû xwe bihêlim û xwe bighînim çiyayan. Ax, ez bi hesreta hertiştî bûm. Min dixwest ku ez çem û çem bimeşim, ji kaniyan avê pijeqînim, bi masiyên belek re bibim dost û bi dizî li sihorîk, kîroşkan û ruhberên biçûk temaşe bikim û bizanibim bê ew çi dikin û sirra rêya wan çi ye. Min weha bawer dikir ku ger wexta min hebuya û ez di nava kulîlkan re bi bêdengî bi xwê re biçûma, min ê ew gava bi hevdû re dikirin pise-pis ûji hevdû re her tiştên biaqil yên ku mirovan qet pê nizanîbûn digotin, zevt bikira."
Trefethan dengê xwe birrî û ji bo bê hela qedeha wî hatiye dagirtin an na, li qedeha xwe nihêrî.
Carekê weha got: 'Min dixwest ku ez bi şev mîna ruhbereke dirinde baz bidim, bi tenê di bin tava heyvê û stêrkan de baz dan, di wê şevreşa ku ez dizanim dê bişibe qedîfeyê sar de, sipî û tazî baz dan, baz dan, bê rawestan baz dan. Êvarekê ez êdî bêhawe aciz bûbûm. Rojeke pirr germ bû. Hevîr nexwestibû hilê, bişavtin şaş hatibû kirin û ez pirr hêrs û gêj bûbûm. Belê, min wê êvarê ji bavê xwe re behsa xwestina xwe ya bazdanê kir. Wî piçekî bi meraq û piçekî jî bi tirs li min nihêrî. Du heb dan min. Ji min re got, here razê, he-
14

ta sibehê dê tu tiştekî te nemîne. Min ne jî wî re û ne jî ji tu kesên din re, careke din behsa xwestinên xwe nekir.'
Mala li çiyê belav bûbû. Bi qasî ku ez dizanim malbatê ji birçîbû-

na bar kiribû û çûbû Saedeyê. Wê li wê derê, di fabrîkeyekê de kar dikir; karekî giran û saetên dirêj. Piştî ku bi vî awayî salek derbas kir, li restoranteke basît û erzan bi şagirtî xebitiye. Wê navê wê restorantê kiribû, xwaringehka feqîran. Wê ji min re carekê got ku 'Qey min romans dixwest. Lê ne di legana ku arava firaxan tê de bû de, ne li fabrîkeyan ne jî li ba xwediyên van xwaringehkan tu romans tunebû. '

Gava zewicî, 18 salî bû. Bi zilamekî ku dê ji bo vekirina restorantekê biçuya Juneauyê re zewicî bû. Mêrik hinek pere dabûn ser hevdû û ji ber vê jî pêşeroja wî rohnî xuya dikir. Keçikê jê hez nekiribû. Keçikê di vê de bi înat bû. Lê ew êdî aciz bûbû û xwestibû ji wê aciziya xwe xelas bibe. Juneau li Alaskayê ye. Xwestina wê ya ji bo dîtina vî diyarê muhteşem, bûbû îhtirasek. Lê beşekî pirr hindik jê dîtibû. Mêrik restorant vekiribû, devereke biçûk û erzan bû. Hîn demeke dirêj derbas nebûbû ku keçikê fahm kiribû bê mêrik ji bo çi bi wê re zewicîbû; ji bo xwe ji dana meaşekî xelas bike. Wê hema hema hemû karên xwaringehkê dikir. Ji şagirtiyê heta firaxşuştinê. Gellek caran, çêkirina xwarinê jî dibû para wê. Bi vî awayî çar sal derbas bûne.

Hun dikarin wê ruhbera daristanên dirinde, wê pîreka ku bi hemû daxwazên kevn ên xwezayî û bi hesreta azadiyê ve dagirtî, lê di maweya çar salên ku nayên tehamulkirinê de, li xwaringeheke feqîr bê rawestan xebitiye, bînin ber çavên xwe?

Wê got ku 'Hertişt bê mahne bû. Ev hemû ji bo çi bûn? Ez ji bo çi hatibûm dinyayê? Ma mahneya jiyanê ev bû? Kar kirin, kar kirin ûhertim westiyayî razan, westiyayî şiyar bûn û ger yek ji ya din ne dijwartir be, her roj mîna roja berê?'

Ji i'ncîlê ew jiyana nemir bihîstibû, lê ferq nedikir, tiştê ku wê di-

kir, ji bo nemirtiya wê amadebûnek bû. Belkî firktir, lê wê xeyalên
15

xwe didan jiyandin. Çend pirtûk xwendibûn? Texmînkirina navên wan gellek zehmet bû. Bi îhtimaleke mezin romançn Pirtûkxaneya Perrê Deryayê bûbûn adana xeyalên wê.
Wê got ku 'Carinan gava ku ez ji ber germahiya metbexê gêj dibûm, ger min hewa paqij nestenda, wê dilê min ji bîr biçuya. Min serê xwe ji pencereya metbexê dirêjî derve dikir, çavên xwe digirt û tiştên herî muhteşem didît. Min ji nişka ve didît ku ez di rêyeke pesar de, ber bi jêr ve dadiketim, hertişt paqij û bê deng, bê toz, bê gemar, bi tenê sira bayê ku gîhayên xweşik kil dikirin, berxên ku bi hevdû şa dibûn, bêhna kulîlkên ku bi bê re dihat û di ser hertiştî re tîrêjên xweş yên tavê, çêlekên dilovan ên ku di pingarên ava bê deng ku dida çongê de, tiralî dikirin û keçikên ciwan ên ku di zîvironeke çem de xwe dişuştin, hemû jî sipî, tenik, pak û xwezayî. Min wextekê di pirtûkekê de li ser vî welatî xwendibû. Belkî wan şovalyeyên ku di tîrêjên rojê de dibiriqîn dê di rê de, di zîvironekekê de bizîviriyan û li ser hespan xuya bûbûyan, an jî min leydiyek ku li ser mehîneke sipî boz û bircên keleha ku ji dûr ve bilind dibû, didîtin. Min ewqas baş dizanîbû ku ez ê di zîvironeka yekem de bihatama qesrekê; sipî û hewadar û mîna ku di çîrokên periyan de bi fîskiyeyên li dora xwe dizîvirîn ve û li her deverê wê, teyrên tawiz ên ku di nava mêrg û kulîlkan de; dû re min çavên xwe vedikir ûgerma firna germ li ser çavên min dixist. Min dengê Jake dibihîst. Jake mêrê min bû. Ji min re digot 'Te fasûlye ji bo çi nebirin? Ji te heye ku ez ê hemû rojê li vê derê bimînim?'
Romans! Ez dibêjim qey dema ez herî nêzîkî romansê bûm, beri-

ya wê gava ku nanpêjekî Ermenî yê serxweş, aqilê xwe bi temamî wenda kir û dikira bi kêra metbexê ez serjêbikirama û min ew bi wê aleta ku me pê petat dieciqand, li erdê rast kir, min milê xwe bi so-bê venîştibû, bû.
Min rêyên hêsan, tiştên xweş û romans dixwest. Lê weha xuya bû ku tu şensa min tunebû. Ez bi tenê û nemaze ji bo xwarinçêkirin ûfiraxşuştinê hatibûm dinyayê. Li Juneauyê wê demê qelabalixeke
16

dijwar hebû, min bala xwe da pîrekên din, jiyana wan tu heyecan neda min. Qey min dixwest ez paqij bim. Ji bo çi? Min jî nizanîbû. Xuya bû, min bi tenê dixwest û min weha bawer dikir ku bê çawa ez bi şuştina firaxan dikaribûm bimirama, bi mirinekee wek mirina wan jî bimirama."
Trefethan çîrok birrî, demekê bêdeng ma. Tevlihevbûna di warê fikrê de bi xwe serrast kir û got;
" Belê, ev pîreka ku ez li herêma Arktîkê rastî wê hatibûm, qebîle-yeke hov û erdekî nêçîrê ku bi qasî çend hezar mîlan bû, îdare di-kir. Ev pirr jî hêsan çêbûbû. Tabîî, ew dikaribû di nava firaxan de jî bimira. Lê xewn û pise-pis derketin ortê. Ev hemû pêwîstî bû û wê ew bi dest xist.
Wê got ku 'Ez sibehekê ji xew şiyar bûm. Tam li ser perçeyekî rojnameyekê bû. Hemû gotinên li wira, tên bîra min. Ger tu bix-wazî, ez dikarim ji bo te bixwînim! Dû re, beşek ji Qêrîna Mirov ji Thoreau xwend. Temaşaya çamên li erdê gêris ku sal bi sal mezin dibin, ji bo min pirr xweş e. Em behsa medenîkirina xwecîhan di-kin, lê navê pêşvebirin û baştirkirina wan, ne ev e. Xwecîh bi serx-webûna şiyar a jiyana tarî ya daristanên çilmisî û bi tenêtiyê ve,

pêywendiyên bi Xwedêyên xwe re diparêze û wek civakeke ecêb tê qebûlkirin. Nerîneke wan a wek çirûsandina stêrkan ku ji bo meyxaneyên me, pirr xerîb e, heye. Bi tenê ji ber durûtiyê, gava ew ronahiya rawestiyayî ya di ruhê wan de heye ku bi ronahiya mûman a bi îhtişam, lê kêm û emirkurt re bête muqayesekirin, mîna rohniya stêrkan a qels, lê pirr xweş xuya dike. Xwedêyên civaka giraviyan bi roj çêbûne, lê bi qasî xwedêyên ku bi şev çêbûne, nayên qebûlkirin.'
0 wê weha kir, gotin bi gotin tekrar kir. Min dengê wê yê madenî ji bîr kiribû. Ji ber ku îzahateke cidî ya olî bû- belkî pûtperest û di nava kincên xwe yên jîndar de-.
Wê bi dengekî xemgîn got; 'Dawiya wê hat çirandin û avêtin. Bi tenê perçeyekî rojnameyê bû. Lê ew Thoreau mirovekî bi aqil bû. Min dixwest ku ez di derheqa wî de xwediyê agahdariyên zêdetir
17

bim! '
Ew hebekî rawestiya û bawer bikin ku gava wê got; 'Ez dikarîbûm ji wî re bûbûma jineke baş' ruyê wê, bi qasî ku mirov nikare bi gotinan bîne zimên, pîroz bû.
Dû re dewam kir; 'Gava min ew xwend, ez tê gihîştim ku bê problema min çi ye. Ez bi şev çêbûbûm. Ez, ew kesa ku hemû jiyana xwe bi yekî ku bi roj çêbûye re derbas kiriye, şevza bûm. Ji ber vê yekê, ez bi çêkirina xwarinê û şuştina firaxan tatmîn nedibûm. Ji ber vê, min di tava heyvê de şût î tazî bazdan, xwestibû. Û ez tê gihîştibûm ku xwaringeha feqîran a biçûk î gemarî ne cîhekî li gora min bû. Gava min ev fahm kir, min got, ev kar qediya! Min çend perçe alavên xwe hazir kir û ez ketim rê. Jake ez dîtim û xwest min rawestîne. Got, tu çi dikî? Min got, Ez ji te vediqetim. Ez ê ber bi

daristanên bilind ve biçim, cîhê min ew dever e. Ji bo girtinê destê xwe dirêjî min kir û got, vNa na, tu naçî. Germahiya firnê li serê te xistiye. Beriya ku tu dînîtiyekê bikî, li min guhdar bikT Lê min devançe - Colteke biçûk bû- lê kişand û min gotê, ev ê li ser navê min bipeyive û ez ji wir veqetiyam."
Trefethan qedeha xwe vala kir û yeka din xwest.
" Begno, hun dizanin, bê vê keçikê çi kir? Emrê wê, bîst û du sal bû. Hemû jiyana xwe li ber legana ku firax tê de dihat şuştin, derbas kiribû û di derheqa dinyayê de, ji zanebûna min a li ser ebada çarem an jî pêncem bêtir, tu tişt nizanîbû. Hemû rê ber bi hedefa wê ve diçûn. Na, wê muracaetî tu salonên reqsê nekir. Li Alaskaya ku dirûvê destiyê taweyekê dide, bi botê rêwîkirin, bêtir tê tercîhkirin. Keçik çû, perrê avê. Kanoteke çermsoran wê biçûya Dyedyê. Hun dizanin, ev ji koka darekê bi tenê çêdibin, zirav, kûr û dirêjbûna wan, şêst pê ne. Çend dollar dawan û li kanotê siwar bû.
Ji min re got; 'Romans? Ji serî û heta binî ve romans bû. Di kanotê de sê malbat hebûn. Bi kûçikan û bi zarokên berşîr ên çermsoran ku bi çarpiyan vir de û wê de diçûn, welhasil di wê kanota ku ewqas teng bû ku mirov nikarîbû xwe bizîviranda, herkesî bêrikek
18

di avê de dadikir ûkanot dimeşandin. Çiyayên bilind yên serê wan bi dûman, dorhêl girtibûn. Ewrên tevlihev diherikîn, tav hebû. 0 ax, bêdengî! Bêdengiya kûr û muhteşem! Mirov dikarîbû ji dûr ve dûmana kampa nêçirvanan a di nava daran de dizîvirî û bilind dibû, bibîne.
Min digot, qey ez li seyrangehê mim, li seyrangeheke mezin, min didît ku xewnên min rast digerin. Ez ji bo qewimandina tiştekî

amade bûm. Oew tişt qewimî jî.
Û ew kampa yekem li giravê! Zarokên ku di devê çem de, bi şewkê masî digirtin û ew pezkoviya mezin a ku gava tam em li tengavê zîvirîn, çermsorekî bera wê da. Her alî bi kulîlkan ve hatibûn xemilandin. Ji perrê avê ber bi hundur ve, gîha tof, şil û bi qasî bejnekê bilind dibûn. Hinek keç bi min re ketin nava gîhê. Em ji aliyê dawiyê ve ber bi gir ve hilkişiyan û me kok û tûfiringîyên tirş lê xwarina wan xweş berhev kirin.
Em di nava erdê tûfiringiyan de li hirçekî mezin ku şîva xwe dbcwar, rast hatin. Wî got; "oyy!" û bi qasî me tirsiya û reviya. Dû re, kamp, agirê kampê û bêhna goştê pezkoviyê yê ku sor dibû. Harîqa bû. Asoxî, ez bi yê ku bi şev çêbûbû re bûm. Min dizanîbû ku ez malê vira mim. Belkî jî ez di jiyana xwe de, cara yekem wê şevê gava ez razam, bextiyar bûm. Ji ber ku wê şevê, min di binê qoziyeke çadirê re, li wan stêrkên reş ên li ser serê girekî xuya dikirin, nihêrî, guhên xwe da dengê şevê û bi şuûra ku eynî tişt dê roja din û hertim jî dom bike, ez paş de venegeriyam.
Romans! Roja piştî wê, min ew bi dest xist. Diviyabû ku em di milekî mezin ê Okyanûsê re derbas bûbûna- bi kêmanî duwanzdeh an jî panzdeh mîl hebû- bê dest pê kir û tam gava ku em li ortê bûn, kanot wergeriya û çû binê avê. Ez wê şevê bi kûçikekî guran re derketim sahîlê. Ez bi tenê sax filitîbûm/ "
Trefethan navbir da çîrokê û got; " Lê bifikirin, kanot perçe bûye ûketiye binê avê. Ji derveyî wê, herkes li zinaran ketine û mirine. Wê bi terriya kûçik girtibû, xwe ji zinaran paraztibû û bi vî awayî
19

gîhaştibû sahîlê. Heta wê sahîla ku dirêjahiya wê, gellek mîl bû, bi

tenê avjenî kiribû. Wê got; 'Ev şenseke mezin bû ku reşahî bû. Ez bi vî awayî tam bi paş de vegeriyam. Ez ketim rê û di nava daristanan re, di ser çiyayan re, hertim ber bi pêş ve meşiyam. Min digot, qey ez li tiştekî digeriyam û min dizanîbû ku ez ê bibînim. Ez ne ditirsiyam. Ez bi şev çêbûbûm. Daristanên mezin nikarîbûn min bikuştana. 0 min ew, roja duduyan dît. Ez hatim devereke biçûk a weha vekirî, qulûbeyeke nîvxerabe hebû. Ji gellek salan û vir de, tu kes tê de ne jiyabû. Jora wê hatibû xwarê. Betaniyên kom bi kom rizyayî, li wira bûn. Li ser sobeyê firax hebûn. Lê tiştê herî xerîb, ne ev bû. Li derve, li ber daristanê, tu di jiyana xwe de nikarî texmîn bikî, bê min çi dît. 'iskeletên heyşt hespan, her yek bi darekê ve hatibû girêdan. Ez weha texmîn dikim ku ew ji birçîna mirine. Li dû wan bi tenê komên biçûk ên hestiyên wan î ku ji hevdû belav bûbûn, mabûn.

Li pişta her hespekî barek hebû. Barên wan, li wira di nava hestiyan de mabûn - torbeyên boyaxkirî... di hundurê torbeyên ji çermên pezkoviyan de û di hundurê wan de - bi te di hundurê wan de çi hebû?' Wê dengê xwe birrî, di quncikekê re, destê xwe di nava guliyên ladînan re dirêj kir û torbeyekî çerm kişand. Devê wî vekir û zêrên herî xweşik bera destê min da. Zêrên destpênebûyî, zêrên ku ava çeman ew anîbûn. Hinek hûr bûn, lê pirraniya wan, kulçe bûn û weha teze û hişk bûn ku mirov digot qey tu carî av bi wan nebûye!

Ji min re got; 'Tu dibêjî ku ez muhendîsê madenê mim. Tu vî welatî jî nas dikî. Tu dikarî navê çemê ku ev zêr aniye, bibêjî?"

Min nizanîbû. Tu zîv tê de tunebû. Hema hema zêrê safî bû.

Min ev ji wê re jî got.

Wê got; 'Rast e. Ez ê onsa wan bi nozdeh dollaran bifroşim. Zê-

rê Eldoradoyê jî ji hîjdeh dollaran zêdetir nake. Tu kes ji bo zêrê Minookê jî tam hîjdeh dollaran nade. Min ev di nava hestiyan de dît, lê tam heyşt barên hespan di her barekî de sed û pêncî Paund/ 20

Min dengê xwe bilind kir û got; Ev du sed û pêncî hezarî dike. Wê got; 'Min jî bi texmînî weha hesibandibû. Em behsa romansê bikin! Ez, wê kesa ku ewqas sal koletî kiribû, gava ez derketim derve, piştî sê rojan, ev qewimî. Baş e, çi bi wan zilamên ku ev zêr derxistin hat! Ez hertim lê difikirim. Hespên xwe barkirî û girêdayî hiştine û ji vê dinyayê wenda bûne. Li dû xwe, tu şop mop nehiştine. Min qet nebihîstiye ku behsa wan hatiye kirin. Tu kes di derheqa wan de tu tiştî nizane. Belê, mîratxura wan a bi heq, wek şevzayekê ez bûm.'
Trefethan ji bo çixareyekê pê xê, rawestiya û dû re dewam kir; "Hun dizanin bê vê keçikê çi kir? Sîh ons ji xwe re veqetand û yên din li sahîlê veşart. Dû re, bi îşaretekê kanota ku di wir re derbas dibû, sekinand û çû bazara Dyeayê. Ji Pat Healyê tişt kirrîn û berê xwe da geliyê Chilcootê, ev bûyer di 88-an de ye. Sal 88 bû, heyşt sal beriya êrîşa Klondikeyê bû. Wê demê Yukan devereke xalî bû. Ji zilamên çermsor ditirsiya, du pîrekên çermsor bi xwe re bir, di gol û çeman re derbas bû û hat kampên kevn ên Yukana jêr.: Piştî ku li wê derê çend salan geriya, dû re hat wî cîhê ku ez pêrgî wê bûbûm. Ji wî welatî hez kiribû. Wê weha got. Tiştê ku herî bêtir bala wê kişandibû û tesîr lê kiribû jî, li binê newalê pezkoviyeke mezin a di nava keskesorê de, bû, ye. Bi xwecîhan re têkilî danî, di halê nexweşiyê de li wan nihêrî, bawerî da wan û hêdî hêdî dest bi

îdarekirina wan kir. Carekê ji wê derê veqetiya, wê gavê jî bi grûpeke xortên çermsoran re çû Chilcootê, zêrên ku veşartibû, derxist û anî ba xwe.
Wê got; '0 nuha ez li vê derê mim, rêwiyo' û çîroka xwe qedand.
"Tiştê herî hêja ku ez xwediyê wê mim, va ye/ got û kîsikekî biçûk ku ji çermê pezkoviyan hatibû çêkirin, derxist. Wek madalyonekê xistibû situyê xwe. Kîsik vekir. Di hundurê kîsikê çerm de, perçeyê rojnameyeke ku jêdera ji Thoreau tê de, kevn, zerbûyî û li hevirmêş pêçayî, hebû. Min jê pirsî; baş e, tu bextiyar î?... Tiştên ku te dix-west, te bi dest xist? Piştî ku du sed û pêncî hezarên te hene, tu ne
21

mecbûr î li eyaletên jêr bixebitî. Xuya ye, tu pirr bêriyê dikî.
Wê got; vNe gdlekî. Ez cîhê xwe bi cîhê tu pîrekên eyaletên jêr nadim. Ev mirovên min in, ez malê vê derê mim. Lê carinanv- Ça-vên wê bi hesreta kûr ya ku min berê behs kiribû, biriqand- vCari-nan ez weha dixwazim ku bila tiştê herî ecêb bête serê vî Thoreau-yê/
Min pirsî; Ji bo çi?
Wê got; vBi vî awayî, ez ê bikarîbûma pê re bizewiciyama. Ez ca-rinan xwe pirr bi tenê hîs dikim. Ez pîrek im, tam pîrek. Ez diza-nim ku behsa pîrekin din ku mîna min digerin û tiştên xerîb dikin, tê kirin. Pîrekên di ordiyê de leşker, di keştiyan de deryavan. Lê ev pîrek pirr ecêb in. Ji pîrekan bêtir dişibin zilaman û îhtiyacên wan, ne wek yên pîrekên normal in. Ew evînê naxwazin, di himbêza xwe de, an jî li dora xwe zarokên biçûk jî naxwazin. Ez ne ji van celeban im. Ma ne rast e, rêwiyo? Ma ez dirûbê zilaman didim?v
Wê bi rastî dirubê wan ne dida. Ew pîrekek bû, pîrekeke xweşik,

pîrekeke di rengê qahweyî yê bihîvan de bû. Laşekî wê yê xurt û bi sihet û çavên wê, şînê tarî û xweşik yên pîrekan bûn.
Wê ji min pirsî; lMa ez pîrek im? Ez pîrek im. Ez ji her alî ve pî-
rek im, lê ya xerîb ew e, tev ku ez di hertiştî de zaroka şevê, zaroka xwezayê mim, lê gava pirs tê zewacê, ez ne weha mim. Ez bawer im ku ev cins, pirranî cinsê xwe dikin. Ez weha mim, em çawa bikin, ez hertim weha mim.
v
Min got; Ma tu dixwazî ji min re tiştekî bibêjî?
Wê got; vQetv û bi sertiya rastiyê ve, li hundurê çavên min nihê-
rî.
vMêrekî min hebû. Ez ji wî re dibêjim, ga; li wî bigere, ger ez ro-
jekê vegerim wan deveran, tê bibînî ku ew eyn wek navê ku min lê kiriye, ye.v
Min piştî du salan mêrik dît. Tam wek gotina jinikê bû. Cangi-
ran û bê hîs, gayekî ku hertişt tev li hevdu dikir û li maseyan miqa-
te bû. Min jê re got; îhtiyaca te ji bo alîkariyê, bi pîrekekê heye.
22

Wîgot;vYekhebûv
Min jê pirsî; Ma tu mêrekî bî yî?
vBelê, wê aqilê xwe wenda kir. Ji xwe, wê hertim digot ku germa-
hiya metbexê dê rojekê min dîn bike. Û weha jî bû. Rojekê, deva-
nçe li min kişand û li kanotekê siwar bû û bi çermsoran re reviya.
Li deryayê firtone li wan rabuye. Hemû fetisînin.v"
Trefethan bi qedeha xwe biliya û bêdeng ma.
Milner bi israr pirsî; vBaş e, lê keçik? Tam gava ku çîrok hesas ûenteresant bû, te birrî. Ma weha dibe?

Trefethan got; "Dibe. Wek ku wê jî digot; ew ji derveyî zewacê, di hertiştî de hov bû û cinsê xwe dixwest. Pirr nazîk bû. Wê raste rast dest bi meseleyê kir. Wê dixwest bi min re bizewice.
Ji min re got; vBiyaniyo, ez te dixwazim. Tu ji vê jiyanê hez dikî. Na na, te payizî xwe bêsebeb li van zinaran nedigirt. Ev dever, pirr xweş e. Ger tu li vira bimînî, wê belkî bi te hîn xweştir bibe. Tu ji bo çi namînî? Ez ê ji te re bibim jineke baş.v
Hertişt bi min ve girêdayî bû. Ew li bende min bû. Ez înkar nakim, ez nîvevîndarî wê bûbûm. Hûn dizanin ku ez qet nezewicîmim. Ger ez weha li jiyana xwe binihêrim, ez dikarim pirr bi rehetî bibêjim ku pîreka ku bi vî awayî tesîr li min kiriye, ew bi tenê ye. Lê hertişt weha bûbû ku aqilê mirov nedigîhastê û min wek centîlmenekî derew lê kir. Min jê re got; ez zewicî mim.
Wê pirsî; vMa jina te li bende te ye?v
Min got; erê.
vMa ji te hez dikî?v
Min got; belê.
Hertişt ev bû. Ew li hember derneket, lê bi tenê carekê, wê gavê piçekî hêrs bûbû.
Got; vTiştê ku divê ez bikim, bi tenê dîrektîv dayin e. Ger ez dîrektîvê bidim, wê gavê tu nikarî ji vira biçî tu deveran. Ger ez dîrektîvê bidim, tu li vira dimînî... Lê ez ê nedim. Ger tu min nexwazî, ez jî te naxwazim... û tu min naxwazî/
*3

Çû ji min re malzeme peyde kir û ji bo rêwîtiyê alîkariya min kir. Gava em ji hevdu veqetiyan, ji min re got; vTe gellekî eyb kir, biyaniyo. Min ji nerînên te hez kir û kêfa min ji te re tê. Ger tu fikra

xwe biguherînî, paş de were.v
Êdî bi tenê tiştek mabû ku min dixwest, ez bikim; ew jî maçîkirineke veqetandinê bû. Lê min nizanîbû, bê ez ê çawa bikim. Belkî qebûl nekira. Wek min got, ez nîvevîndar bûm. Baş bû ku wê ev mesele hel kir. Ji min re got; vMin maçî bike, biyaniyo! Bi tenê ji bo çûyin ûbibîranînê.v
Û me hevdû li geliyê çiyayê zinaran, di nava berfê de maçî kir. Min ew li wê derê, li ser rê hişt û min da dû kûçikên xwe. Heta ku min gelî derbas kir û ez daketim jêr û gîhaştim bazara li kêleka Gola mezin a Êsîran, şeş hefte derbas bûn."
Qelebalixiya cadeyan mîna pêlekê, ji dûr ve digihîşt guhên me. Garsonê ku bi bêdengî kar dikir, qedehên me ji nû ve dagirtin. Di bêdengiyê de, dengê Trefethan wek nakosa cenazeyê bû.
" Ger ez li wira mabûma, dê bastir bûbûya."
Me simbêlên wî yên sipî, devera rût ya serê wî, kîsikên werimî yên di bin çavên wî de, gepên wî yên daliqyayî, gerdana wî ya qelew, betilîbûna giran, sistbûn û qelewbûna wî dît. Vana hemû ketina zilamê ku demekê xurt bû, lê pirr baş û rehet jiyabû, nîşan didan. Bardwell hema hema bi awayê pise pisê got; " Ne dereng e, kalo?"
Trefethan qîriya; " Hey Xwedêyo! Xwezka, ez ne tirsonek bûma! Wê gavê ez ê paş de vegeriyama ba wê. Ew hîn li wira ye. Min dikarîbû li siheta xwe binihêriya û li wê derê, bi wê re pirr dirêj bijiyama. Li mayina li vir întixar e, lê ez kal im; çil û heft salî. Li min binihêrin, mesele..."
Trefethan qedeha xwe rakir, lê nihêrî û dû re dewam kir; " Mesele, hêsanbûna vê celeba întixarê ye. Ez nerm û nazîk im. Heta fikra rêwîtiya dirêj a bi kûçikan re jî min ditirsîne. Fikirandina li serma

serê sibehan û qarmiçiyên taxokan jî min ditirsînin. "
M

Qedeh ji derveyî îrada wî, ber bi lêvên wî ve bilind bû. Bi pêleke esabê, xwest qedehê biavêje erdê, lê dû re poşman bû û rawestiya. Tiştekî din hat bîra wî. Qedeha xwe ber bi lêvên xwe ve bilind kir û rawestiya. Bi dilşewatî û bi qehir keniya, lê peyvên wî bi tesîr bûn;
" Belê, em ji bo zaroka şevê, ji bo şevzayê vexwin. Ew mûcîzeyek bû."
*5

XWÊDANAENIYÊ
Va wextê kar hat. Xwedê min ji karê min veneqetine.
Ger ez berî ku şev bi ser me de were bimrim,
Hêviya min ji xwedê ev e ku bila karê min qediya be.
Amîn
"Johnny, binihêre, ev cara talî ye ku ez ji te re dibêjim; ger tu ranebî, divê tu taştê ji bîr bikî!"
Ev forta hanê çavê lêwik netirsand. Lawik, weke yekî ku xewneke pirr xweş didît û ne dixwest jê şiyar bibe, heta ku jê dihat di berxwe de dida Destên wî bi sistî hatin girtin û kulmikin lerzokî li hewa kil bûn. Hedefa van kulmikan diya wî bû. Lê jinikê dema ku bi milên wî girt û kil kir, weke hertim vê carê jî xwe ji kulmikên wî parast.
"Min rehet bihêlê!"
Ev bangkirin weke bi destanpeyvandina yekî razayî dest pê kir û dû re ji nişka ve bilind bû û bû qêrîneke dijwar. Di taliyê de jî hêdî hêdî qels bû, di devê wî de bû weke vinvineke ku nedihat fahm ki-

rin û wenda bû. Mirov digot qey, êşeke giran dikşîne û li hember jiyana xwe îsyan dike. Lê diya wî, qet guh neda vê reaksiyona wî. Pîrekeke weha bû ku mirov ji çavên wê xemgîniya wê û ji rûyê wê jî betilîbûna wê dikaribû bixwenda. Ev wezîfa ku wê her roj dikir, êdî ne xema wê bû. Xwe çengî lihêfê kir û xwest ku ji ser lêwik bavêje. Hingê lêwik dev ji kulmikavêtinê berda, bi awakî bê hêvî hişk bi lihêfê girt û xwe li çarşefa ku li binya nivîna bû, gerand. Jinikê îcar xwest çarşefê ber bi erdê ve bikişîne. Demekê di ber hev de dan. Jinik ji wî girantir bû. ji ber vê yekê hem lêwik û hem jî lihêfe maxlûbiyet qebûl kirin. Lawik ji bo xwe ji serma dijwar ya odeyê biparê-
26

ze, bêî ku lihêfa germ berde, tevî çarşefê, xwe heta ber nivînê xwe, bi erdê re kişand. Heta kêleka nivînê xwe hat. Dema li xwe hay bû ku dike bi ser serê xwe de bikeve û bigindire, ji nişka ve şiyar bû û balansa xwe serrast kir û li ser lingên xwe ket erdê. Di eynî wextê de, diya wî ew ji milên wî girt û kil kir. Lawik careke din dest bi kulmikan kir. Vê carê kulmikên wî xurttir û serrasttir bûn. Ji nişka ve çavên wî vebûn. Hingê diya wî milên wî berda. êdî şiyar bibû. Lawik di ber xwe de got::
"Temam temam"
Jinikê rahişt lampê û lawik di tarîyê de hişt û derket derve. Dema ku di derî re derket, bala lêwik kişand û got:
"Ew dê pereyên te bibirin ha!"
Johnny guh neda tarîyê. Kincên xwe li xwe kir û berê xwe da metbexê.
Hew hestî û çerm ma bû. Lê bi saxlemî pê li erdê dikir. Halbûkî çîpên wî weke darikan bûn. Mirov digot qey ew dê nikaribin gira-

niya lasê wî hilgirin. Kursiyeke ku binîjêketî bû kişand bin xwe û li kêleka maseyê rûnişt.
Diya wî bang kir:
"Johnny!"
Johnny ji cîhê xwe pengizî. Bêî ku tu gotin ji devê wî derkeve, berê xwe da (lawabo) destşokê. Destşok bi rûn bû. Pirr gemarî bû. Ji qulika wê, bêhneke weke bêhna beratê dihat. Guh nedayê. Tu tişt nikaribû bi qasî hatina bêhna pîs ji lawabo, tebîî ba. Ji aravê reş-bûna sabûnê û kefdan jibîrkirina wê jî tebîî bû. Sabûn kef bide, dê çi bibe, kef nede dê çi bibe. Ger te çend dilop av li ser çavên xwe ki-ribe, temam e. Diranên xwe firçe ne dikir. Tew di emrê xwe de, fi-rçe-mirçe jî nedîtibû. Wî tew nizanîbû ku li ser rûyê erdê, bêaqilên bi qasî ku diranên xwe firçe bikin jî hebûn. Diya wî bi ser wî de kir pit pit û got:
"Qe, rojekê bêî ku min ji te re bigota, te ruyê xwe bişuşta!" Jini-kê kapaxa misînê qehwê bi destê xwe girtibû û qehwe dixist fînca-
27

nan. Lêwik dengê xwe dernexist. Ji ber ku ev mesela serçavşuştinê, hertim dibû sebebê munaqeşeyê. Diya wî serê wî dixwar. Rojê care-kê ji mecburî divê serçavê xwe bişuşta. Bi peşgîreke peritî ya bi rûn, şil û gemarî, xwe zuha kir; pirtikên peşgîrê bi ruyên mirov diman. Dema ku hate ser sifrê, diya wî jê re got:
"Xwezî em ewqasî ne dûrî cîhê kar bûna. Tu dizanî ku çi ji des-tên min tê, ez dikim. Lê em çawa bikin, ew dolara ku ji ber kirê di-mîne, pirr girîng e. Tew odeyên vir jî pirr in, tu bi xwe jî vêya diza-ni.
Gotinên diya wî di guhekî wî re diketinê û di yê din re derdike-

tin. Eynî gotin ewqas dibîhîst ku! Diya wî pîrekeke hezan û serhişk bû. Gava devê xwe vedikir, eynî mesele bû; peyv hertim dianî ser wan derdên ku ji ber mala wan dûrî fabrîkê ye, dikjînin.
Lawik bi awakî ku peyvekê li binçengê diya xwe xe, got:
"Rast e, dolarek, tê wê maneya ku çend pariyên zêde dê têkeve qirika me. Divê ez bilezînim û têkevim rê. Kawê taştiyê bîne."
Nanê xwe nîvco dicût, ew pariyên ku baş nedihat cûtin, bi xêra qehweyê dadiqurtand. Bi lez dixwar. Ew tiştê ku wî vedixwar, dişi-biya aravê. Ji bo ispatkirina qehwebûna wê aravê, hezar şahid lazim bûn. Halbukî Johnny di got qey, ev qehwe ye û hem jî qehweyeke pirr qenc e. Ev yek ji wan çewtfahmkirinên wî yên jiyanê bû. Di emrê xwe de, tu carî qehweya rast ta'm jî nekiri bû. Bi nan re hinek jambonê cemidî hebû. Diya wî fîncana wî ya qehwê careke din tije kir. Dema pariyê xwe yê taliyê avêt devê xwe, weke yekî ku digot ma hîn heye, li diya xwe dinihêrî. Ev nerînên tijepirs ji çavên diya wî ne reviyan.
Diya wî got:
"Pirrxuriyê meke, Johnny! Te para xwe xwar, xwuşk û birayên te, ji te piçûktirin."
Bersiva vê gotina diya xwe ne da. Wekî din jî ew ne yekî weha bi pirrpeyv bû. Dev ji bi çavên birçî li dora xwe nêrînê berda. Bi sebir bû. Tu gazin ji rewşa xwe nedikir. Qehweya xwe qedand. Bi pişta
28

destê xwe devê xwe paqij kir û ji bo çûyinê rabû ser xwe.
Diya wî xwe avêt ortê û got:
" Ka bisekine belkî ez bikaribim ji nên perçeyekî din derxim... Lê perçeyekî tenik..."

Di tevgera wê de, bilezbûna hoqebazekî xuya dibû. Ji nanê somûn, tu parî jê nekir. Lê weke ku jê kir da xuya kirin. dû re somûn xiste qutiya nên û ji herdu pariyên xwe yek dirêjî wî kir. Diya wî weha bawer dikir ku wê lawik xapandiye. Lê ev bilezbûna destên wê, ji çavên lêwik nereviya bûn. Lê car din jî, bê fedî rahişt nên. Ji ber nexweşiya kronîk ya diya xwe, weha bawer dikir ku ma'dê diya wî zêde nediçû xwarinê. Jinikê dema dît ku lawik nên zuha zuha dicû, qehwa xwe jî bera fîncana wî da û xwest îzah bike:
"Sebep çi ye, ez nizanim. Lê vê sibehê dilê min naçe tu tiştî."
Dengê zirav yê pîspîskekê, herdu jî rakir ser piyan. Jinikê li saeta ku di refikê de bû, nihêrî. Mîlên saetê pênc û nîv rê dida. Karkerên dinya fabrîkeyê yên mabûn, hîn nuh ji xew şiyar dibûn. Diya wî şalek avêt ser milên wî û şepqeyekî kevn, gemarî û rengjêçûyî da serê wî. Fitîla lampeya gazê daxist û got:
"Divê em baz bidin."
Bi destpelînkê rêya xwe dîtin û bi pêlikê daketin. Hewa paqij bû, lê serma hebû. Johnny bi temasa hewayê ricifî. Li ezmên stêrkan hîn dest bi wendabûnê nekiribûn. Bajar tarî bû. Hem Johnny û hem jî diya wî, dema ku dimeşiyan piyên xwe bi erdê re dikişandin. Mirov di got qey tu taqet di çongên wan de ne maye û lingên wan li dû wan dikşin. Piştî ku bi qasî panzdeh deqîqeyan meşiyan, diya wî li destê rastê zîvirî. Beriya ku di tarîyê de wenda biba, temiya xwe ya talî li lêwik kin
"Tu dereng nemînî ha..."
Johnny tu peyv lê venegerand û rêya xwe dewam kir. Deriyên derve yên fabrîkeyê nuh vedibûn. Johnny jî ketibû nav girseya ku tarîtî dagirtibû. Dema ku di deriyê fabrîkê re derbas bû, dengê pîspîskê careke din jî hate bihîstin. Li aliyê rojhilat nihêrî û dît ku ro-

niyeke qels di ser baniyên xaniyan re xuya dibû. Beriya ku pişta xwe bidê û di nav hevalên xwe yên kar keve, hemû roniya rojê ya ku wî dît ewqas bû. Di nav rêza makîneyan de, cîhê xwe stand. Li ber wî, li jora sindoqa ku tije bobînên piçûk bû, bobînên mezin dizîvirîn. Bi tiliya girdikê û ya îşaretê serê ta digirt, bi destê xwe yê rastê jî bi aliyê din yê tayê bobîna piçûk digirt. Hereketên herdu destên wî jî diviyabû di eynî wextê de û bi lez bana. Dû re bi lez girêkeke tevn-vaniyê davêtê û bobîn serbest ber dida.
Rojekê pesinî bû û gotibû:
"Ez di xew de jî dikarim girêkan bavejim."
Di vê gotina wî de, rastiyek hebû. Di hinek şevan de, xewnin ku mirov digot qey bi sedsalan berdewam dikin, didît. Di wan xewnan de girêkavêtin tu carî ne diqediyan. Hinekan jî bobînên ku vala di-bûn bi derengî diguhartin. Ji ber vê yekê hem wext dihate wenda kirin û hem jî makîne li valahiyê dizîvirîn. Ji bo pêşîlêgirtina vê de-rengbûnê, nêrevanek li ser serê wan dima. Carekê, dema ku cîranê Johnny qelpî kir, nêrevan bi wî hesiya; guhê wî kişand, bi ser de qî-riya û got:
"Li Johnny binihêre... ji bo çi tu ne wekî wî ye?"
Bobînên Johhny pirr zû vala dibûn û ev pesindanên indirekt jî qet tesîr lê ne dikirin. Hetta carekê... lê pirr zû de bû. Dema wekî nimuneyekî hate nîşan dan, li rûyê wî yê bêhîs tu guhartin xuya ne-bûbû. Karkerekî pirr baş bû. Wî vêya dizanîbû. Vêya ewqas jê re hatibû gotin ku êdî nema tu tesîr lê dikir. Wekî din jî ji bo wî tu qiymeta van pesindayinan tunebûn. Ne karkerekî bêqusûr, lê êdî bûbû makîneyeke bêqusûr. Ne ku tu carî çewtîtî nedikir. Lê gava di

karê wî de, çewtîtiyeke peyda biba jî, ev wek çewtîtiya makîneyê ji ber çewtîtiya malzemeyan dihat. Bê çawa, ji qalibekî bê qusûr ya bizmaran, îmkana çewt çêkirina bizmarekî, çi qas mumkun ba, çewtîtîkirina wî jî ewqas mumkun bû. Di vê ya de, tiştekî ku mirov diviyabû lê ecêbmayî bima, tune bû.
Rojeke wî jî bê makîne derbas nebûbû. Mirov digot qey makîne
30

di hundurê wî de ye û ew bi makîneyê re mezin bûye. Beriya nuha bi duwanzdeh salan, li odeya bobînpêçandina vê fabrîkeyê, hedîse-yeke piçûk çê bûbû. Dilê diya Johnny ji bîr çûbû. Jinik di nav gir-gira makîneyan de, li erdê dirêj kiribûn. Bangî du pîrekên bi emir hatibû kirin. Serekhoste jî alî wan kiribû. Piştî çend deqîqeyan, ji dervayî wan kesên ku di derî re ketibûn hundur, însanekî din jî li odeya tevnê peyda bûbû; ev Johnny bû. Johnny di nav girgira ma-kîneyan de hatibû dinyayê. Pişikên wî hîn bi nefesa wî ya yekem re, hewa germ û bi rutûbet ya ku karkerên pembo hertim di nav de bûn, hate dagirtin. Di roja yekem ya jiyana xwe de, ji bo xwe ji tif-tikê biparêze kuxuyabû. Ji wê rojê û heta nuha, ew kuxuk her ber-dewame.
Lawikê ku li kêleka Johnny dixebitî, bi îske-îsk bêvilaxwe kişand.
Ji serçavên lêwik nefreta li hember nêrevanên ku bi awakî tehdîtkar lê dinihêrî, dahate xwendin. Lê hemû bobîn bi lezbûna herî talî di-zîvirîn. Lawik ji bobînan re, hertim çêr dikir. Lê dengê wî pênc-şeş metreyan jî ji wî wê de ne diçû. Gume guma odeyê, ev deng weke dîwarekî dadiqurtand. Johnny guhê xwe qet ne dida vana. Evan bûyeran êdî tu tesîr lê nedikirin. Hingî hertim tekrar dibûn, bûbûn monoton. Gelek caran bûbû şahidê hedîseyên weha. Li gor wî; li

hember nêrevan derketin, bi qasî li hember makîneyê derketinê bê feyde bû. Makîne ji bo xebatê û ji bo bi vê xebatê ve hinek kar bi-cîhanînê, hatinin çêkirin. Ev tişt ji bo nêrevan jî derbas dibû. Lê sa-et di n-an de, li odeyê heyecanek hebû. Ev heyecan bi carekê li her derê belav bû. Lawikê bi lingekî yê ku li kêleka Johnny dixebitî, tev darên ku dixist binçengên xwe, ji nişka ve wenda bû. Mudurê Fab-rîkeyê bi mirovekî xort re kete hundur. Mirovê ku bi mudur re bû, taximekî kincê paqij û qutikekî qolakirî li xwe kiribû. Li gor bi si-nifkirina Johnny, ev efendiyek bû û bêşik divê mufettîş ba jî. Dema ku di ber wan re derbas bû, bi awayekî sert li zarokan dinihêrî. Ca-rinan jî disekinî û ji wan hinek tişt dipirsî. Dema ku dipirsî, diviya-bû bi dengê hêl bipeyiviya. Ji bo ku dengê xwe bigihîne wan, ewqas 3i

bang dikir ku rûyê wî bi awayekî xerîb diqermiçî. Kenê mirov pêdi-hat. Ew dezgeha li kêleka Johhny ya ku vala dizîvirî, ji çavên wî yên ku dilîztin, nereviya. Lê tu tişt negot. Dema ku çavê wî bi Johnny ket, di cîh de sekinî. Ji bo ku Johnny metreyekê ji makîneyê bi dûr bixe, bi milê wî girt. Lê milê wî bi dengekî ecêbmayî berda.
Mudurê fabrîkeyê ji heyecana keniya û got:
"Çiqaszeîfe."
Mufettîş got:
"Darikên çixaran. Li van çîpan binihêre. Bi vî zarokî re nexweşiya hestiyan heye. Hîn destpêk e, lê heye. Ger ew taliyê bi dayê nekeve jî, tu xelasbûna wî tuneye. Ji ber ku ew dê berê ji ber jana zirav bimre."
Johnny lê guhdar kir, lê tu tişt fahm nekir. Ji xwe nexweşiya ku dê di pêşerojê de derkeve pêsiya wî, ew qet alaqadar nedikir. Ji ber

ku nuha nexweşiyeke xerabtir ya ku di şiklê mufettîşekî de wî tehdît dikir, li ber bêvila wî bû. Mufettîş ji bo dengê xwe bigihîne lêwik, xwe daqûl kir û di guhê wî de got, lê ya rastî bang kir:
"Li min binihêrî kurê min. Ez dixwazim ku tu ji min re rastiyê bibêjî. Tu çend salî yî?"
"çardeh salî "
Johnny derew kir. Wexta ev derew kir, ewqas bang kiribû ku he-mû quweta pişikên xwe bikar anîbû. Bi vê bangkirinê re, kuxukeke zuha wî girt û tîftikên pembo yên ku bi pişikên wî ve zeliqî bûn, kil bûn. Mudur:
"Bi kêmanî 16 salî xuya dike."
Mufettîş:
"Yajî6osalî!"
Mudur got:
"Ew hertim weha xuya dike."
Mufettîş bi lez pirsî:
"Ev çiqas e ku ew weha ye?"
Mudun
32

"Gelek sal derbas bûn. Lê ew tu carî kal nabe."
Mufettîş:
"Tu ji bo çi nabêjî ku ew tu carî nabe xort. Ez weha bawer im ku hemû emrên ku tê xuya kirin jî li vê derê derbas bûne."
Mudur got:
" Carinan dixebitî û carinan jî dev ji kar berdida," û ji nişka ve lê zêde kin "Lê ev berî qebûlkirina vê qanûna nuh bû."
Mufettîş makîneya ku bi bobînên nîvpêçayî digeriya îşaret kir û

pirsî:
Ma ev makîne vala ye?"
"
Mudur:
" Weha xuya ye."
Mudur bangî nêrevan kir, ew makîne rê wî da. Bi ser wî de rabû, di guhê wî de tiştin gotin û dû re vegeriya ser mufettîş û îzah kin "Makîne vala ye."
Dema ku mufettîş û mudur derbas bûn û çûn, Johnny jî vegeriya ser karê xwe. Ji ber ku nexweşiya xwe bê qeza û bela derbas kiribû, hilma xwe berda û oxînek kişand û-dilê wî rehet bû. Lê şensa lawikê bi lingekî, ne bi qasî ya wî bû. Mufêttîşê ku çavên wî zîz dibûn, weke ku bi destên xwe xistibûyê, ew ji sindoqê kişand û derxist. Lêvên wî diricifîn. Rûyê wî wek rûyê yekî ku felaketek bi serê wî de hatiye, bû. Nêrevan qaşo ev cara yekem e ku lêwik dibîne, şaş mabû. Mudur şok derbas kiribû. Rûyê wî zer bûbû.
Mufettîş got:
"Ez vî lawikî nas dikim. Evi2 salî ye. Min ew îsal, sê caran ji fabrîkeyê qewirandiye. Ev dibe cara çaran."
Mufettîş li lawikê ku bi lingekî bû, zîvirî û got:
"Ka te soz dabû min ku tu dê biçûya dibistanê?" '
Çavên lêwik tije hêsir bûn û ji nişka ve weha got:
"Ji bo Xwedê mufettîş beg, du zarokên me mir in. Em maleke pirr feqîr in."
Mufettîş weke ku lêwik bi sûcê cînayetê îtham dikir, pirsî:
33

"Tu ji bo çi weha dikuxe?"

Lawikê bi lingekî li hember vê îthamkirinê, bi awayekî xweparastinê bersiv da:
"Tiştekî min tuneye, mufettîş beg. Min hefteya berê hebekî serma girtibû. Hemû ewqas e."
Lawik bi mufettîş re ji odeyê derket û mudur jî nerazîbûna xwe diyar kir û da dû wan û derket. Dîsa hewayeke monoton, hundurê odeyê dagirt.
Sibeheke dirêj û paşnîvrojeke ku ji wê jî dirêjtir qediya û pîspîska ku wexta qedandinê diyar kir, lê ket. Dema Johnny ji deriyê fabrîkayê derket, tarîyê xwe ji zûde bera erdê dabû. Di navbeyna ketin û derketina wî ya fabrîkayê de, tavê li ezmana nêrdewaneke zêrînî danîbû û germahiya xwe ya dilovan li dinyayê belav kiribû. Dû re nizm bûbû û li aliyê rojava, di nav ewrên ku ji ber baniyên xaniyan ve, perçe perçe dihatin xuyakirin de, wenda bûbû.
Li malê dahnekî xwarinê tenê hebû ku hemû endamên malbatê hazir dibûn. Ew jî şîv bû. Johnny û xuşk û birayên wî, tenê di vî dahnê xwarinê de, li ser sifreyekê dihatin ba hev. Ev bihevrebûn ji bö Johnny wek herbê bû. Wî xwe kal lê gelekî kal(ixtiyar) didît û xuşk û birayên xwe jî pirr ciwan didît. Wî nikarîbû tehamulî bêkêrî û bêfesaltiya wan bikira. Ji xwe, ji wan fahmkirin pirr zehmet bû. Zaroktiya wî gelekî li paş mabû. Ji ber bêfesaltî û rûşuştîbûna wan, xwe pirr aciz dikir û bûbû weke kalekî asabî. Di demên weha yên ku pirr diqeherî de, xwe bi fikra ku rojekê ji rojan ewê jî ji bona nanê xwe bixebitin, teselî dikir û xwarina xwe bê deng dixwar. Wî dê teb'ên wan yên ku ne baş bûn, ji wan bibirya û wan jî weke xwe bikira mirovên cidî û giran. Wek hemû mirovên din, Johnny jî xwe pîvan dihesiband û hemû kaînat li gor vê pîvanê dinirxand.
Dîya wî li ser xwarinê tiştên xwe yên berê, yanî gotina xwe ya ku

" Çi ji destên min tê, ez ji bo we dikim" tekrar dikir. Xelasbûna wê xwarina ku ji xwe têra wan nedikir, pêsiya van gotinan birrî. Johnny kursîya bin xwe bi paş de dahf da û ji sifreyê rabû. Li ber
34

deriyê odeya raketinê û deriyê ji derve bi awayekî dudilî sekinî û taliyê jî derket derve. Ji malê dûr neket. Li ber devê derî rûnişt. Çongên xwe ber bi jorê kişand, bi milên xwe yên teng daqûlî pêş bû, enîşkên xwe danî ser çongên xwe û destên xwe da ber rûyê xwe. Li tu tiştekî ne difikirî; rûniştibû û îstirahat dikir. Zihnê wî di xew re çûbû. Xuşk û birayên wî li derve bi zarokên din re dilîztin û bi şematakê li dora Johnny diçûn û dihatin. Lampeya li qoziyê lîstika wan ronî dikir. Wan dizanîbû ku Johnny zû diqehere û asabî dibe. Lê hewesa macerayê wan ber bi wî ajot. Li pêşiya wî bi destên hev girtin, laşên xwe bi aheng kil kirin û dest bi dîlokeke bi qerf kirin. Johnny dest bi çeran kir. Ev çer ji hosteyê fabrîkeyê hîn bûbûn. Lê ev çêr bê feyde dîtin, cidiyeta xwe anî bîra xwe û ket nav bêdengiyekê.
Birayê wî yê ku li pişta wî, Will hîn nuh ketibû sala dehan. Will serokê zarokan bû. Johnny ji wî qet hez nedikir. Ji piçûkaniya xwe û vir de, wî her li Will niheriye û temenê(emrê) xwe ji bo alîkariya wî amade kiriye. Will ji dêlba ku rabûya û rûnişta, jê re dûa bikira, nankorî dikir. Johnny di wextê berê de, ji zaroktiya xwe tu xêr nedîtibû. Wextên wî yên lîstinê, bi xwedîkirina Will re derbas bûbû. Will wê demê zarokekê pêçekê bû. Dîya wî wê demê jî weke nuha, bi rojê li fabrîkayê kar dikir. Ji ber vê yekê, Johnny ji will re hem hinek dêtî û hem jî hinek bavtî dikir. Weha xuya bû ku Will ji vêya baş îstifade kiribû. Laşê wî saxlem xuya dikir. Têra xwe dagirtî bû.

Di bejna Johnny de bû. Lê jê qelewtir û girantir bû. Mirov di got qey jîndarî û xwîna yekî ketiye damarên yekî din. Ev ji aliyê ruhî jî weha bû; Johnny westiyayî bû, bêdeng bû û zuha mabû. Lê birayê wî yê piçûk heta ku tu bibêje, li ser xwe bû û di cîhê xwe de nedisekinî. Dîloka biqerf her çû bilind bû.
Will dema ku dans dikir, hêdî hêdî ber bi wî de dihat, xwe daqûl dikir û zimanê xwe jê re derdixist. Destê Johnny ji nişka ve dirêjî pêş bû û hişk bi qirika Will girt. Kulmika xwe ya destê din jî li orta bêvila yê din xist. Ev kulmikeke qels bû û bi hêrs hatibû avêtin. Lê
35

bi qasî ku birîndar bike sert bû. Qêrîna lêwik vêya îspat dikir. Qêrîn bi zarokên din ketibû. Xuşka Johnny, Jennie ber bi malê baz da. Johnny, Will bi paş de dahf da û pihînek li qapaxa çonga wî xist û dû re wî ser dev de avêt nav heriyê. Heta ku rûyê wî çend caran di heriyê de neda jî dev jê berneda. Pirr derbas nebûbû, dîya wî bi rûyekî xemgîn û bi xezebekê hat. Dîya wî bi ser wî de rabû. Johnny jî li hember vêya weha got:
"Ji bo çi ew bela xwe di min de dide? Ji bo çi min di halê min de nahêle? Ma tu nabînî ku ez westîyayî me?"
Will bi rûyê herîbûyî û bi çavên bi hêsir, di nav destên dîya xwe de, bang kir:
"Êz jî bi qasî te mezin im. Ez dê hîn jî mezin bibim. Wê gavê ez dê rê te bidim, bê ka dinya çawa ye... Tu bisekinî, tu dê nuha bibînî!"
Johnny:
"Ger tu ewqas mezin be, ji xwe re karekî bibînî. Di eslê xwe de, sûcê te bi xwe jî ev e... Divê tu bi kêrî tiştekî bê. Ji te re kardîtin jî

wezîfeya dîya te ye."
Dîya wî li hember vê gotina wî derket û got:
"Lê ew hîn pirr piçûk e. Ma emrê wî çi ye!"
Johnny:
" Dema ku min dest bi kar kir, ez ji wî piçûktir bûm."
Johnny devê xwe vekir û dikira ew neheqiya ku li wî hatibû kirin, bigota. Lê devê wî bi şîrmaqekê hate girtin û bi awayekî bê hêvî li ser paniyên xwe zîvirî, kete hundur û çû odeya xwe ya raketinê. Deriyê odeyê ji bo germahiya ji metbexê tê, tesîra xwe lê bike, vekirî hatibû hiştin. Johnny di nîvtariyê de, kincên xwe ji xwe dikir. Di eynî wextê de, axaftina dîya xwe û ya pîreka ku cîranê wan bû jî dibihîst. Dîya wî digirîya. Axaftina wê bi bêvilkişandineke pirr bêruh dihate qut kirin. Dengê dîya wî dihat guhê wî:
"Ez nizanim bê çi bi Johnny hatiye. Wî berê, tu carî weha nedikir. Melekekî piçûk û bi sebir bû."
36

Dû re dest bi parastina wî kir:
" Ew di eslê xwe de lawikekî pirr baş e. Bi her awayî xwe daye kar. Di emirekî pirr piçûk de, dest bi kar kir. Lê çi gunehê min heye... Ez bi vêya bawer im ku çi tiştên ku ji destên min tê, ez dikim."
Hîn jî dengên îsk îsk û bêvilkişandinan ji metbexê dihat. Dema qapaxên çavên wî hatin girtin, di ber xwe de weha got:
"Ha, bila tu vêya zanibî... Tab'î ez bi ruh û can xebitîm."
Dîya wî serê sibehê, wî dîsa kil kir û ji xewa şêrîn rakir. Dû re dîsa ew taştiya ku qula diranekî danedigirt; di tarîtiya reş de rêwîtî û tîrêjên qels yên roja ku berî Johnny pişta xwe bidê û di derîyê fabrîkayê re têkeve hundur, di ser baniyên xanîyan re xuya dibûn...

îroj jî wek hemû rojên din bû. Hemû roj wek hev bûn...Di jiyana wî de tiştê ku mirov jê re karîba bigota guhartin, hew di dema ku ji karekî derbasî karekî din dibû, an dema ku nexweş diket, peyda dibû. Ji seş saliya xwe û vir de, ji Will û ji xuşk û birayên xwe yên din re dê û bavtî kiribû. Dema ku heft salî bû ketibû fabrîkayê û dest bi karê bobîn pêçandinê kiribû. Di heşt salîya xwe de, derbasî fabrîkeyeke din bûbû. Karê wî yê nuh pirr rehet bû. Hemû tiştên ku wî dikir ev bû; Wî ji bo ku çemê qumêş rast biherike, bi darekî piçûk ew îdare kir. Ev çemê qumêş ji zikê makîneyê dihat, di ser sîlîndîreke sorkirî re derbas dibû û diçû alîyê din û rêya xwe dewam dikir. Ew hertim li eynî cîhî rûdinişt; Li cîhê ku roj nedidît û di bin lampeyeke gazê ya ronîlerzokî de, bûbû perçeyekî mekanîzmayê. Johnny tev germahiya bi mezeloq jî ji karê xwe memnûn bû. Ji ber ku hîn pirr ciwan bû û gelek xeyalên wî hebûn. Dema ew qumaşên ku dûkel jê diçûn, di ber wî re derbas dibûn, ew diket nav xeyalan, hem jî çi xeyalên harîka. Lê karê wî tu huner nedixwest. Aqil bikaranîn ne pêwîst bû. Ji ber vê yekê jî aqilê wî bi wextê re tembel bûbû, êdî di xew re diçû û xeyaldîtin jî hêdî hêdî kêm dibû. Ji xwe di hefteyekê de, ancax du dolar diketin destên wî. Ev herdu dolar, sembola ferqa di navbeyna feqîriya kronîk û birçîbûna dijwar de bû.

37

Lê dema ku emrê wî bû duwanzdeh, ji kar hat derxistin. Sedema vêya sorik bû. Piştî ku rehet bû, di fabrîkayeke caman de dest bi kar kir. Li vê derê pereyên ku diketin destên wî, bêtir bûn û karê wî huner jî dixwest. Ji ber ku li gor hesabê perçeyan, mûçe(maaş)distend, çiqasî zêde kar bikira, pereyên ku diketin destên wî jî ewqas

zêde bûn. Ev kar karekî teşwîqkar û bi hereket bû. Johnny bi tesîra vê teşwîqê bûbû karkerekî baş. Kar gelekî hêsan bû. Johnny tapayên cam bi şûşeyên piçûk ve girêdida. Hertim gilokeke qinab pê re hebû. Ji bo ku bikariba bi herdu destên xwe kar bikira, şûşe dixist nav çongên xwe. Ji ber ku dema rûdinişt, xwe bi ser çongên xwe xwar dikir û duqatî dibû, xûz bûbû û rojê deh saetan ta'de li kafesa sînga wî dihat. Rûniştina weha ji bo pişikan qet ne baş bû. Lê wî rojê sê sed duzîne şûşe girê didan û ji bo vêya jî tu rêyeke din tunebû. Mudur bi wî gelek dipesinî. Ji bo xelk wî bibîne, wan dawetî fabrîkayê dikir û Johnny nîşanî wan dida. Di hundurê deh saetan de, sê sed şûşe ji destên wî derdiketin. Ev îspata ku ew gihaştibû mukemeltiya makîneyê bû. Hemû hereketên nepêwîst ji dervayî kar hatibûn hiştin. Her hereketa milên wî yên zirav û her livandina adaleyên tilîkên wî yên zirav, bi lez û bi aheng bû. Ji ber ku wî hertim di nav stressê de kar dikir, pirr asabî bûbû. Adaleyên wî bi şev diciviyan ser hev û bi roj, ji xwe tu firseta xwerehetkirinê û îstirehetkirinê nedidît. Hertim bi stress bû û adaleyên wî jî hey dicivîyan. Rûyê wî bi wextê re çilmisî bû. Kuxuka ku ji ber lîfên bi pişikên wî ve zeliqî bû, pê re peyda bûbû, her diçû girantir dibû. Dema ku pişikên wî serma girt û bi zatûreyê ket, karê xwe yê di fabrîkeya caman de jî wenda kir. Nuha vegeriyabû ser karê xwe yê ku cara yekem di fabrîkaya lîfan de, bi bobînan dest pêkiribû. Lê vê carê terfîkirin li pêşiya wî bû.

Karkerekî baş bû. Piştî demeke din, ew dê derbasî beşa qolayê û dû re jî odeya dezgeha tevnê biba. Ji vêya zêdetir bilind nedibû. Tiştên ku ji vêya pê ve zêde biba, bereketa kar bû. Makîne ji dema ku cara yekem, ew ketibû kar bileztir dixebitîn. Lê serê wî hêdî di-

3»

xebitî. Edî xeyal-meyal dîtin tunebû. Halbûkî salên wî yên destpê-
kê, bi xeyalan dagirtî bûn. Carekê evîndar bûbû. Ev evîn, dema ku
bi darekî rêya qumaşê ku di ser sîlîndîrê germ diherikî, rast dikir, pê
re peyda bûbû. Keçika ku dilê wî ketibûyê, keça mudurê fabrîkeyê
bû. Keçik ji wî bi emirtir bû. Hema hema jinek ciwan bû.
Johnny tev de şeş caran, ew jî ji dûr ve ew dîditibû. Lê bila weha
ba, dê çi zerarê wê heba? Li ser rûyê qumaşê ku di ber wî re dihe-
rikî, planên xweş yên pêşerojên çêdikir, di kar de serkevtinên mûcîze-
yî bi dest dixist, makîneyên nehatine dîtin îcat dikir, îdareya fabrî-
keyê dixist destên xwe, dibû patronê fabrîkayê û dû re keçik him-
bêz dikir û wê ji enîya wê maçî dikir. Lê vana pirr li paş man. Ji bo
evînê pirr kal û westiyayî bû. Keçik zewicî bû û çûbû. Aqilê wî keti-
bû xewê. Lê çi dibe bila bibe, ev ji bo Johnny bûbû tecrubeyeke
pirr baş. Bê hinek jin û zilam çawa li rojên xwe yên ku dema ji perî-
yan bawer dikirin, dizîvirîn û difikirîn, Johnny jî weha difikirî. Wî
ne ji perîyan û ne jî ji Noel bawer dikir. Lê wî ji dil baweriya xwe bi
xeyala pêşeroja dibişirî ya ku li ser çemê qumaşê ku dûkel jê diçû
çêdikir, anî bû. Jiyanê ew zû kiribû zilam. Di heftsalîya xwe de, de-
ma ku heqê xwe yê hefteyê stand, dest bi zilamtiyê kiribû. Wê gavê
hîseke serxwebûnê ketibû dilê wî. Têkiliyên wî yên bi dîya wî re ha-
tin guhartin. Li vê dinyayê bi kêrî tiştekî dihat. Êdî pere diketin
destên wî û nan û xwarin dianî malê. Ji ber vê yekê, ew jî bûbû wek
dîya xwe. Dema bû yanzdeh salî û dû re şeş mehan di wardiyeya şe-
vê de kar kir, êdî tam dest bi çaxa xwe ya zilamtîyê kiribû. Tu zarok
piştî karê wardiyeya şevê, zarok namîne. Di jiyana wî de, yek-du
hedîseyên mezin çêbûbûn. Ji vana yek, dema ku dîya wî alûcê Kali-
forniyayê kirîbû û ya duduyan jî dema dîya wî krema çêkiribû, ha-

tibû meydanê. Evana bûyerên mezin bûn. Dema Johnny vana di-
anî bîra xwe, dilê wî xweş dibû. Di wan deman de, dîya wî behsa
şêranî çêkirinê kiribû. Li gor dîya wî navê we " Girava ku avjeniyê
dike" bû û "ji krema jî xweştir" bû. Johnny dema li ser sifreyê rûdi-
nişt, hertim bi hesreta "girava ku avjeniyê dike" bû. Lê bi wextê re
39

ew jî xist nav îdealên xwe yên ku mirov qet nikare bigihêjê. Rojekê,
li peyarêkê 25 sentê zîv dît. Tev ku taliya wê bi dilêşî qediya bû jî
ew jî yek ji wan hedîseyên mezin yên jiyana wî dihat hesibandin.
Dema ku çavê wî li biriqandina pereyê zîvî ket, berî ku ji erdê rahê-
jê, wî wezîfeya xwe ya di rewşên weha de zanîbû. Li malê wek her-
tim xwarin tunebû. Bê çawa heqê hefteya xwe ya ku di her roja şe-
mîyê de distand, dibir malê, diviyabû ev pere jî raste-rast bibira ma-
lê. Rastiya di vê rewşê de pirr eşkere bû. Lê wî tu rojekê jî pereyên
xwe, bi xwe xerc nekiribû. Tew dilê wî jî ewqas diçû şekir!
Dema ku behsa şekir dibû, ji xwe dilê wî ji bîr diçû. Ancax di
cejn-mejna de, devê wî bi şekir dibû. Li xapandina xwe negeriya.
Wî dizanibû ku tiştê ew dike, guneh e. Lê bi zanebûn, bi panzdeh
sentên ji wî pereyî, ji xwe re şekir kirî. Deh sentê ku ji ber ma jî ji
bo ziyafeteke din hilanî. Lê ji ber ku hîn fêrî pere bi xwe re gerandi-
nê nebûbû, deh sentê xwe wenda kir. Ev pere tam jî di dema ku bi
wîcdanê xwe re ketibû muhasebeyekê, hatibû wenda kirin. Vêya
wek cezayeke îlahî hate dîtin. Ji ber nêzîkbûna dehşet û xezeba xwe-
dê, tirsek ket dilê wî. Xwedê wî dîtibû. 0 xwedê berî ku ew gunehê
xwe tam bike, ew ceza kiribû. Dema ev hedîSe, wek cînayeta herî
mezin ya di jiyana xwe de, bi bîr dianî, wîcdanê wî diêşiya û ji nû
ve diket nava êşên giran. Tiştê wî yê dizî ku ji ber fedî dikir, ev tenê

bû. Bi poşmanî li vê hedîseyê difikirî û dilê wî dişewitî. Awayê xerc-kirina bîst û pênc sentan ne li gor dilê wî bû. Wî dikarîbû ew bi awakî hîn baştir xerc bikira. Ger wî zanîba ku xwedê di mesela ce-zadanê de, dê ewqas bi lez hereket bikira, wî dê temamê bîst û pênc sentê xwe bi derbekê re xerc bikira. Di xeyala xwe de, ew bîst û pênc sent hezar carî xerc dikir û di her xerckirinê de, ta'mek baştir jê distend. Bîranîneke wî ya din hebû. Bîranînek ku pirr baş nedi-hat bîra wî. Lê dîsa jî bi lingên bêmerhamet yê bavê wî, di kûrahiya ruhê wî de mabû. Ji tiştekî xuya bêtir, dişibiya kabûsekî. Tu ferqa vê bîranînê, ji xewna mirovê ku di xewa xwe de, ji derekê digindire û dikeve nava bapîrên xwe, ttinebû. Ev bîranîn di bin ronahiya rojê
40

de, dema ku ew şiyar bû, nedihat bîra wî. Bi şev, dema ku tam wê di xew keta, dihat bîra wî û xewa wî direvand û ew şiyar dikir. Di destpêka vê xewna ku mirov nexweş dikir de, Johnny digot qey ew li binya nivînê xwe, çepûrast dirêjkirî ye. Di nav cîha de, weke ku xeyala dê û bavê xwe di nav xumamê de didît. Wî qet nizanûbû ku bê bavê wî dişibiya çi. Tiştek tenê zanîbû, ew jî lingên bavê wî yên bêmerhamet û wehşî bû. Hemû bîranînên wî yên destpêkê, bi ba-vê wî re derbas bûbûn. Lê tu bîranînên wî yên aîdî salên dawiyê tu-nebûn.Hemû roj dişibiyan hevdû. Do an sala çûyî, wek hezar salî bûn... An jî wek deqîqeyekê... Tu hedîse çênedibû. Tu bûyera ku bûbûya nîşana herikandina zemên tunebû.
Zeman nedimeşiya. Li cîhê xwe sekinî bû. Bi tenê makîneyên ku dizîvirîn, hereket dikirin. Makîne tev ku hertim zûtir û wek gulê di-zîvirîn jî nediçûn tu deveran. Gava temenê wî bû çardeh, li beşa qo-layê dest bi kar kir. Ev bi serê xwe hedîseyek bû. Nîhayet tiştekî ku

ji dervayî xewa şevekê an mûçeyê hefteyekê, bi bîr bianîya çêbûbû. Ev destpêka demeke nuh bû. Hedîseyeke ku demeke dîrokê tayîn dikir... Weke olîmpiyadeke makîneyan bû. Ji devê wî hertim ev peyv diherikîn:
"Dema ku ez derbasî beşa qolayê bibim," an "paşê" an jî "beriya ku ez derbasî beşa qolayê bibim."
Salawexta xwe ya şanzdehan li beşa tevnê û li dezgehê pîroz kir. Ev cîha cîhekî teşwîqkar bû. Ji ber ku dîsa li gor hesabê perçe kar dikir. Li vê derê jî kesek nikaribû bigihişta wî. Çunkî dezgehan wî baş strabûn û jê makîneyeke baş derxistibûn. Di dawiya meha sisiyan de, du dezgeh; dû re sê û herî talî jî çar dezgeh bi hev re dbcebitandin. Di dawiya sala duduyan de, ji tevnvanekî hoste wêdetir, ji karkerekî wasat du qat zêdetir qûmaş çêdikir. Her ku digihişt tixûbê herî bilind yê perestendinê, tiştên ku dihatin malê jî zêdetir dibûn. Lê pereyên ku diketin destên wî, tu carî têra ihtiyaciyên wan nedikir. Zarok mezin dibûn. Hîn bêtir dixwarin. Diçûn dibistanê. Ji bo pirtûkên dibistanê jî pere lazim bû. Tiştê xerîb ew bû ku
4i

Johnny çiqas bi lez bixebitiya, fiyetê hertiştî jî ewqas bi lez zêde dibû. Tew kirêya xanîyê ku ji ber bêtamîriyê tu nemabû biketa jî zêde bûbû. Bejna wî êdî dirêj bûbû. Lê bejna wî ya dirêj, ew zeîftir û ziravtir dida xuya kirin. Bêtir asabî bûbû. Bi vê asabiyetê re xeydokîbûna wî û bêtehamuliya wî jî zêde bûbû. Zarokan, piştî ku çend caran dersa xwe ji Johnny stendin, êdî jê ditirsiyan.
Bi dîya wî re, li hember vê quweta wî ya pere karkirinê, hurmetek bi tirsê re tevlihev peyda bûbû. Ji bo Johnny tu ta'ma jiyanê tunebû. Wî roja ku dinya ronî dikir, tu carî nedidît. Bi şev, ji dervayî

îradeya xwe, ji nişkave ji xew vediciniqî û şiyar dibû. Di wextê mayî de jî kar dikir. Şûûra wî dişibiya ya makîneyekê. Ji dervayî vêya serê wî vala bû. îdealên wî tunebûn. Xeyalek wî tenê hebû; Wî di got qey ew sibehan, qahweyeke bi ta'm vedixwe. Ew heywanekî kar bû. Jiyana wî ya fikrî qet tunebû. Lê di kûrahiya mejiyê wî de, li deverek ku wî jî nizanîbû, her hereketa destên wî û rakşandina adaleyên wî, ji bo her saeta xebatê tên pîvandin, wezinandin, hilbijartin û haziriya ji bo gelek hereketên pêş ku hem wî hem jî dinya wî ya piçûk ecêbmayî dihişt, dihate kirin. Di dawiya biharê de, şevekê dema ku ji karê xwe vegeriya, ji betilbûna xwe ya hertim bêtir betilî xuya dikir. Gava ku li kêleka maseyê rûnişt, atmosfereke weke ku mirov li bende tiştekî bû, hebû. Lê wî vêya ferq nekir. Wî di nav bêdengiyekê de, lê wek makîneyekê dest bi xwarinê kir. Çelp çelpa devê zarokan bû û digotin:
"Immm; ox".
Lê Johnny ew nedibihîstin jî. Dîya wî di talîyê de, bi awakî bêhêvi je pirsi:
"Ma tu dizanî ku tu çi dbcwî?"
Johnny berê li xwarina ku li ber xwe bû û dû re jî li dîya xwe nihêrî.
Jinikê bi kêf got:
"Girava ku avjeniyê dike".
Johnny got:
42

"himmm".
Zarokan bi hev re bang kirin:
"Girava ku avjeniyê dike".

Johnny dîsa got:
"himmm".
Piştî ku du-sê parîyên din jî xwar, got:
"Ez bawer im ku ez vê êvarê ne birçî mim." Kevçî danî, kursiya xwe paş de dahfda, bi awakî westiyayî ji sifreyê rabû û got:
"Ez dê biçim razêm."
Gava ku li metbexê dimeşiya, lingên xwe girantir dikşand. Kinc ji xwe kirin, karekî ku quweteke mezin dixwast û bê feyde bû. Gava bi ferek sola xwe, çû ser cîhê xwe digirîya. Di mejiyê xwe de, tiştekî ku her diçe bilind dibe û gûr dibe, hîs kir. Wî di got qey, tilîkên wî yên zirav bi qasî zenda destê wî xuya dikir. Di serên tilîkên wî de, hîsek xerîb û nediyar wek ya di mejîyê wî de, hebû. Hemû hestiyên wî diêşiyan. Êşê xwe li hemû laşê wî belav kiribû. Di hundurê serê wî de, bi mîlyonan dezgeh dest bi girgir û çîr-çîrkê kiribûn. Hemû ezman bi mekîkên ku difiriyan, hatibû dagirtin. Ev mekîk di nav stêrkan de, çixêzên tevlihev çêdikirin û bi vir de û-bi wir de diçûn. Johnny bi tena serê xwe, hezar dezgeh dixebitandin. Her ku bilez-bûna dezgehan zêde dibû, mejiyê wî jî bi lezbûneke zêde ji hev ve-dibû û dibû tayekî ku li wan mekîkê difîriyan, gerandî.Sibehê neçû kar. Ew bi hezar dezgehên ku di serê wî de hebûn ve, meşgûl bû. Dîya wî berî ku biçe kar, ba doktorekî kiribû. Doktor got ku; ew bi grîpeke giran ketiye. Jenny jê re hemşîretî kir û tembîhên doktor bi cîh anîn. Ev tayeke weha dijwar bû ku heta Johnny kincê xwe li xwe bikira û li odeyê li ser xwe bimeşiya, diviyabû hefteyek derbas bûbûya. Li gor gotina doktor, wî dê piştî hefteyekê kariba dest bi karê xwe bikira.
Roja yekşemê, serekhoste hat ziyareta wî. Ji dîya wî re got ku di beşa tevnê de, tevnvanê herî baş Johnny e. Karê wî li bende wî bû.

Piştî roja duşemê, di hundurê hefteyekê de dikarîbû vegeriya ser ka-
43

rê xwe. Dîya wî got:
"Johnny ma tu ji bo çi spasî wî nake?"
Dû re li ser navê wî ji mêvanê xwe, doza lêbihurînê kir:
"Divê tu li qusura wî nenerî. Ew gelek li ber nexweşiyê ketiye,
hîn hişê wî nehatiye serê wî."
Johnny rûniştîbû. Qopika pişta wî derketibû û li erdê dinihêrî.
Piştî çûyina serokhoste jî heta demeke dirêj weha rûniştî ma. Derve germ bû, piştî nîvro derket derve û li ber derî rûnişt. Carinan lêvên wî kil dibûn. Mirov digot qey di nava hesabên bêser û ber de wen-da bûye û çûye. Sibeha din, piştî ku dinya baş germ bû, dîsa derket û li ber derî rûnişt. îcar ji bo hesabên xwe ji cîhê ku mayî berde-wam bike, pênûs û kaxiza wî jî hebûn. Hesabên pirr tevlihev û ecêb çêkir. Nîvro dema ku Will ji dibistanê vegeriya, jê pirsî:
"Piştî milyonê çi tê?... Û çawa tê nivîsandin?"
Wê rojê, hesabê xwe piştî nîvrojê qedand. Dîsa herroj derdiket derve û li ber derî rûdinişt, lê êdî bê pênûs û kaxiz bû. Hogirî dara li hember rê bûbû. Herroj bi saetan lê hûr dibû. Dema ku ba hemû guliyên wê kil dikir û pelên wê tev li hev dikir, întresa wî zêdetir di-bû. Di hemû hefteyê de, bi xwe re ketibû nava sohbeteke kûr û dûr. Roja yekşemê, dema ku li ber derî rûniştibû, bi dengê hêl çend caran keniya. Dîya wî ya ku ji zûde kenê wî nedîtibû, pirr şaş ma-bû. Jinik di berbanga sibehê de, ji bo şiyarkirina wî çû ba wî. Ji ber ku Johnny ev hefteyek bû ku têra xwe raza bû, bi hêsanî şiyar bû. Qet di ber xwe de neda. Gava ku dîya wî lihêf ji ser wî kişand jî hişk pê negirt. Ew bêdeng radiza. DîSa bi eynî bêdengiyê dipeyivî:

"Tu fêydeya wê tuneye, yadê".
Dîya wî di got belkî hîn gêjiya ku ji ber xewê, ji ser xwe neavêti-
ye, got:
"Tu dê dereng bimînî."
Johnny got:
"Ez şiyar im, yadê. Min ji te re got ku tu feydeya wê tuneye. Ya
baş, min rehet bihêle. Ez ranabim."
44

Dîya wî bang kin
"Lê tê ji kar bê avêtin."
Johnny bi dengekî bêdil û xerîb dubare kin
"Ez ranabim."
Wê sibehê jinik jî neçû karê xwe. Ev nexweşî, ne ji wan nexweşi-
yên ku wê pêdizanîbû. Wê ji bidestanpeyvîn û tayê fahm dikir. Lê
ev dînitiyeke eşkere bû. Lihêf dîsa avêt ser Johnny. Dû re Jennie
şand pê doktor. Gava ku doktor hat, Johnny di xewa şêrîn de bû.
Li hember şiyarbûna xwe derneket. Ji bo li nabzê guhdarkirinê jî tu
tişt negot.
Doktor got:
"Tu tiştekî wî tuneye. Pirr zeîf bûye, hemû ev
Tenê hestî û
e.
çerm maye..."
Dîya wî ji nişka ve got:
"Ew hereim weha ye"
Johnny got:
"Yadê, êdî here. Min bihêle ku ez xeweke rehet bikim."

Johnny bi dengekî mulahîm û şêrîn dipeyivî. Bi eynî mulahîm û şêrînbûnê, xwe li ser kêlekê zîvirand û raza. Saet di dehan de, ra-bû ser xwe û kincên xwe li xwe kir, çû metbexê. Dîya wî li wê derê bû. Taswasekê ew girtibû. Johnny got:
Yadê, ez diçim. Ez dixwazim, xatirê xwe ji te bixwazim."
Jinikê ji nişka ve berdilka xwe avêt ser çavên xwe û dest bi girî kir. Johnny bi sebir li bende wê sekinî. Jinikê bi îsk îskî got:
"Tiştê ku ez jê ditirsiyam, hate serê min."
dû re berdilka xwe ji ser çavên xwe avêt û bi awakî bi tirs û bi meraq li lawê xwe nihêrî û jê pirsî:
"Bi ku de?"
Johnny:
" Ez nizanim... Kî derê dibe, bila bibe."
Gava ku dipeyivîn, dara li hember rê, bi tîrêjên zelal di xeyala Johnny de, bi ruh hat. Mirov di got qey di bin qapaxên çavên wî de
45

bû û gava ku bixwesta dikarîbû bibîne. Dîya wî bi dengekî lerzokî pirsî:
"Lê karê te?"
Johnny:
"Ez ji îro pê ve, nema kar dikim."
Qêrîn bi dîya wî ket û got:
"Haho xwedêyo! Weha nebêje!"
Van gotinên Johnny, ji bo jinikê wek sixêfan bû. Dîya Johnny wek jina ku dibihîse lawê wê xwedê înkar dike, şok derbas dikir. Hema hema bi hişkahiyeke tawanbarkar pirsî:
"Tu bi ya kîjan şeytanî dikî?"

Johnny:
"Reqem... Reqem... Min vê heftê gelek hesab çêkirin. Hesabên weha ku dê aqilê te bisekine."
Jinikê bêvila xwe kişand û got:
Çi alaqa çûna te bi vêya heye, ez fahm nakim."
Johnny bi sebir keniya. Stress û asabiyeta Johnny çûbû û di şûna wan de sakîntiyek peyda bûbû. Dîya wî li vêya ecêbmayî ma. Taswasa dîya wî her diçû, zêdetir dibû.
Johnny got:
"Li min binihêrî û guhdar bikî. Ez pirr westiyayî me. Çi min diwestîne? Hereketkirin. Ez ji roja ku hatime dinyayê û vir de hereket dikim. Ez ji hereketkirinê westiyam. Ez êdî nema hereket dikim. Tê bîra te, dema ku ez di fabrîkaya caman de dixebitîm? Min rojê sê sed duzîne kar derdixist. Min hesab kir ku ez ji bo her şûşeyekê deh hereketên cîhê dikim. Vêya di rojekê de, dike sî û şeş hezar hereket. Di deh rojan de, sê sed û şêst hezar hereket. Ev di mehê de, bû mîlyonek û heyştê hezar hereket? Hadê em bêjin, heyştê hezarî bavêje, bila here..."
Bi dilpakî û rehetiya xêrxwazekî dipeyivî."
Belê heyştê hezarê wê bavêje, di mehekê de mîlyonek hereket dimîne. Ev jî di salekê de, dike duwanzdeh mîlyon hereket. Min di
46

tevnvaniyê de, ji vêya du caran zêdetir hereket dikir. Ma ev jî ji te re bû, bîst û pênc mîlyon hereket? Wekî din jî ez dibêjim qey ev mîlyon sal in ku ez di halê hereketkirinê de me. Min vê hefteyê qet hereket nekir. Bi saetan, min tilîka xwe jî tev ne livand. Ez ji te re bibêjim; Mirov bêî ku tiştekî bike, bi saetan li vê derê rûne jî nikare jê

têr bibe. Ez berê tu carî ewqas kêfxweş nebûbûm. Min ji bo vêya tu carî wext nedîtibû. Min hertim hereket dikir. Ezê êdî nema tu tişte-kî bikim. Ezê tenê rûnim, dîsa rûnim, îstirahat bikim, dîsa îstirahat bikim û dû re hinekî din jî îstirahat bikim."
Jinikê bi xemgînî pirsî:
"Baş e, lê Will û zarokên din wê çawa bibin?"
Johnny :
" Erê ha, Will û zarok."
Lê di dengê wî de tu qehr tunebû. Wî ji mêj de dizanîbû ku dilê dîya wî bi ser birayê wî yê piçûk ve bû. Lê êdî vêya wî zêde aciz ne-dikir. Wî nema guh dida tu tiştî. Guh nedida vêya jî.
"Ez dizanim bê tu ji bo Will planên çawa difikire, yadê. Nîyeta te ev e ku tu wî bide xwendin, bike hesabdar û bike zilam. Lê êdî fey-de nake. Min dev ji kar berda. Ji îro pê ve, divê ew bixebite."
Jinikê xwest bi berdilka xwe ser çavê xwe bigre, lê dû re dev jê berda û dest bi girî kir:
"Mezin bike, bighîne û dû re bila weha bibe..."
Johnny bi nezaketeke bi keder bersiva dîya xwe da:
"Te min mezin nekir. Min xwe gîhand û mezin kir, yadê. 0 min Will jî mezin kir. Ew ji min girtir, girantir û dirêjtir e. Ez bi zaroktî baş xwedî nebûm. Gava ku ew hate dinyayê û di dema wî ya zarok-tîyê de, ez xebitîm û min heqê nên anî malê. Lê êdî qediya. Will di-vê ya weke min kar bike, ya jî here binê dojehê. Kîjanê hildibijêre, bila hilbijêre, êdî ne xema min e. Ez westiyam, êdî diçim. Ma tê ji min re nebêjî, rêya te vekirî be?"
Jinikê bersiv nedayê. Dîsa berdilka xwe avêtibû ser çavên xwe û digirîya. Johnny li binderî demekê sekinî. îsk îska jinikê bû û digot:
47

"Heta ku hişê min û qûweta min digihaştê, çi ji destên min di-
hiat, min kir. Ez bi vêya bawer im."
Johnny ji malê derket û di kolanê de, ber bi jêr meşiya. Gava ku
ew dara bi tenê dît, rûyê wî bi kêf vebû. Bi dengekî zirav, di ber
xwe de weha digot:
" Ez ji nuha û pê ve nema tu tiştî dikim."
Bi xwestineke xurt li ezman nihêrî, lê tîrêjên rojê yên ku dibiri-
qandin, çavên wî tarî kirin. Li ber wî rêyeke pirr dirêj hebû û wî
qet nedilezand. Fabrîkeya lîfan derbas kir. Gava dengê girgira dez-
gehan hate guhê wî, bişirî. Ev bişirandineke şêrîn û dilovan bû. Ji
kesî nefret nedikir; heta ji makîneyen ku gir gir û çîrke çîrk dikirin
jî nefret nedikir. Di dilê wî de kîn- mîn tunebû, tiştek tunebû. Bi
tenê daxwazeke xurt ya îstirahatê hebû. Her ku nêzîkî pesaran dibû,
erdê fireh dihatin pêşiya wî, xanî û fabrîka êdî zêde nedihatin dîtin.
dû re bajar bi temamî li pê wî ma. Da ser xaçerêyeke bi dar ya ku li
kêleka rêya hesin û meşiya. Ev ne meşa mirovekî bû. Di eslê xwe
de, nedişibiya mirovan. Karîkaturekî mirovan bû. Milên wî yên da-
ketî, pişta wî ya xûz, bejna wî ya kinik, sînga wî ya teng... Ew bûbû
perçeyekî jiyanê yê bênav ku wek maymûnekî nexweşî duqatî, xwe
bi erdê re dikşand.
îstasyoneke piçûk ya trênê derbas kir û xwe li bin darekê, li ser gî-
hayê dirêj kir. Hemû paşnîvroya xwe li wir derbas kir. Carinan xil-
maş dibû. Carinan jî ji ber ku adaleyên wî dihatin hev, ji nişka ve ji
xewê şiyar dibû. Gava şiyar dibû jî bêî ku tev bilive, wek qalibekî
vediket; Ji cîhê xwe yê ku lê veketîbû, li çûkan temaşe dikir ya jî di
nav gulîyên dara ku di ser serê xwe re, li ezmana dinihêrî. Çend ca-
ran bi dengê hêl keniya. Lê tu alaqa vî kenî û tiştên ku didît ya jî

dibihîstin, tunebû. Piştî ku roj çû ava û tarîya destpêka êvarî xwe bera erdê da, trêneke bara bi dengekî bilind hate îstasyonê. Johnny, gava ku lokomotîfê, vagonên trênê li dû xwe dikşand û meqes diguherî, xwe nêzîkî trênê kir. Derîyê vagoneke vala ya bara vekir, bi zehmetî hilkişiya û kete hundur. Derî girt.
48

Lokomotîfê li tûtûkê xist. Johnny xwe li erdê dirêj kiribû û di tarîyê de dibişirî...
49

YÊMEKSÎKÎ
Tu kesî çîroka wî nizanîbû. Tew endamên Juntayê bi yekcarî nizanî bûn bê ew çi kes e. Ew "sirra wan î piçûk" û " welatperwerê wan î mezin" bû. Û ji bo şoreşa Meksîkayê ya ku nêzîk dibû, li gor hêza xwe, bi qasî wan bi xîretî xebitî bû. Heta ku ew bi vê yekê hesiyan, gelek wext derbas bûbû. Ji ber ku di nav Juntayê de, tu kesî jê hez nedilcir. Wê roja ku ew kete hundurê lokala qelabalix û biteqûreq ya rêxistinê, hemûyan şika ku ew ji terefê ajanên Dîaz ve hatiye kirrîn, jê kiribûn. Gelek heval di girtîgehên sivîl û leşkerî yên Dewletên Yekbûyî de bûn û yên din jî ji bo ku li ber dîwarekî tûxla bên gulebaran kirin, bi destkelepçekirî derbasî aliyê dinî hudûd dikirin. Lêwik di çavpêketina cara yekem de, tu întîbayeke pozîtîv li ser wan nehiştibû. Ew xort bû û emrê wî, ji hîjdeh salan ne zêdetir bû. Li gor emrê xwe jî pirr girs xuya nedikir. Wî navê xwe wek Felîpe Rîvera dabû nas kirin û gotibû ku ew dixwaze ji bo şoreşê bixebite. Hemû ewqas bû; ne peyveke zêde û ne tu îzahatên din... Ew li ser piya bû û dipa. Ne di lêvên wî de tu bişirandin û ne jî di çavên wî

de tu nerîneke dostane hebû. Paulîno Vera yê bertewîl jî dema ku li lêwik niherîbû, di hundurê xwe de ji nişka ve ricifandinek hîs kiribû. Li vê derê mexlûqek ku sawek dixist dilê mirov û nedihat fahm kirin hebû. Di çavên lêwikî reş de, nerînek wek nerîna marê bijahr hebû. Ev çav bi neyarîyeke kûr û konsantrekirî wek agirekî sar diçûrisandin. Wî çavên xwe ji ser bihevresûndxwaran dagerand û berê xwe da xanima Sethby ya ku daktîlo bikar tanî. Çavên wî sanîyeyekê li ser wê ma. Dema çavên wan li hev ketin, xanima Sethby dest û lingên xwe li hevdû geriyayî hîs kir. Bi jinikê re hîseke ecêb û xerîb ya ku bû sebeba qutkirina karê wê jî peyda bû. Jinikê ji bo
50

berdewamkirina nivîsandina nameya xwe, çend rêz ji nû ve xwendin. Paulino Vera bi çavên tijepirs li Arrelano û Ramos nihêrî. Wan jî bi eynî awayî hem li wî û hem jî li hevdû nihêrîn. Ji çavên wan şik û bêqerarbûna wan dihat xwendin. Di vî xortê tenik û zirav de, hemû talûkeyên ku ji nenasiyê dihatin, xuya dibûn. Ew, nenasî bi xwe bû. Ew, yekî ku ji terefê şoreşgerên durust yên ku ji Dîaz û zalimtiya Dîaz nefreteke bêhed û hudûd (tenê nefreteke durust ya welathezan) dikirin ve nikarîbû bihata fahm kirin. Ew, tistekî ku aqilê wan nedigîhaştê bû.
Vera yê ku ji hemûyan jîrtir û bileztir, bi dengekî sar got:
- Baş e. Tu dibêjî ku ez dixwazim ji bo şoreşê bixebitim. Çaketê xwe ji xwe bike û li wê derê daliqîne. Ka bi min re were, ezê cîhê paçik û satilê nîşanî te bidim. Erd gemarî ye. Tu dê berê vê derê paqij bike û dû re odeyên din. Gemar divê bê avêtin û paşê dora paqijkirina paceyan tê.
Lêwik pirsî:

- Ma ev ji bo xatirê şoreşê ye?
Vera bersiv da:
- Belê, ev ji bo xatirê şoreşê ye.
Rivera bi nerînên bişuphe li wan kesên ku li odeyê bûn nihêrî û dû re çakêtê xwe ji xwe kir û got:
- Weha be, baş e.
0 hemû ev bû. Êdî her roj dihat karê xwe; erd dimalt, firçe dikir û paqij dikir; ariya sobeyan vala dikir, êzing û komir tanî û berî ku yê wanî herî jêhatî bihata û li ber maseya xwe ya nivîsandinê rûniş-ta, sobe jî pêdixist.
Wî rojekê weha pirsîbû:
- Ma gelo destûr heye ku ez li vê derê razêm?
Ihi! Mesele ev bû, va tiliya Dîaz xuya bû. Razana li odeya Juntayê dihat maneya bidesrxistina sirrên rêxistinê, lîsteyên nava û navnîşa-nên hevalên ku li Meksîkayê dimînin. Ev daxwaza wî nehat qebûl kirin û Rîvera careke din jî behsa vê meseleyê nekir. Wan pê nizanî-5i

bûn bê lawik li ku radiza û dixwar. Rojekê Arrellano çend dollar di-rêjî wî kiribû. Lê wî serê xwe kil kiribû û pere qebûl nekiribû. De-ma ku Vera mudaxele kir û ji bo qebûlkirina pereyan zor dabûyê, weha gotibû:
Ez ji bo şoreşê dixebitim.
Ji bo destpêkirina şoreşekê pere lazim bû û Junta jî di vî warî de hertim di tengasiyê de bû. Endamên Junta birçî bûn û heta ku ta-qet di wan de hebû dixebitîn. Lê dîsa jî gelek caran, biserketin û ne-biserketina şoreşê bi peydekirina çend dollaran ve girêdayî bû. Ro-jekê dema ku wan kirêya du mehan nedabûn û xwediyê xênî wan

bi jixênîderxistinê tehdît kiribû, yê ku şêst dollarê zêrîn danîbû ser maseya May Sethby, lawikê paqijker Felîpe Rîvera yê ku kincên erzan û riziyayî lê bû. Li ser maseya May Sethby, sê sed nameyên bi daktîloya ku rawestandin lê tunebû, hatibû nivîsandin, (daxwazên alîkariyê; daxwaza selahiyeta ji grûpên karkeran yên organîzekirî; ji bo di beşa nûçeyan de muameleyeke adîl, daxwaziyên ji redaksiyonên rojnameyan; Protestoyên li dijî wê mûameleya zalim ya ku dadgehên Dewletên Yekbûyî bi şoreşgeran re dike) nepostekirî li bende pûlan sekinîbûn. Saeta Verayî zêrî kevn ku ji bavê wî mabû, hatibû firotin. Hungulîska zêrî bêdesen ya May Sediby jî bi wî awayî çûbû. Rewş bê hêvî xuya dikir. Ramos û Arrelano simbêlên xwe yên dirêj ji bêçaretiyê ba didan. Name diviyabû bihata şandin û daîreya posteyê jî pûl bi deyn nedidan. Wê gavê Rîvera şepqeyê xwe da serê xwe û derket derve. Dema ku ew vegeriya hezar pûlên dusentî danî ser maseya May Sethby.
Vera ji hevalên xwe re got:
- Ez meraq dikim, gelo ev ne zêrên Dîaz yên lanetlêhatî bin?
Eniyên xwe qermiçandin û fikirîn, lê nizanîbûn bê ewê li çi bifîkiryana. 0 bi vî awayî Felîpe Rîvera, ew lawikê ku ji bo şoreşê erd paqij dikir, dema lazim dibû, ji bo şoreşê dana pereyên zêr û zîvî her berdewam kir. Hîn jî dilên wan lê venebûbû. Wan ew nas nedikirin. Rêyên wan ne yek bû. Wî tu bawerî nedabû. Firseta pirski-
5»

rinê nedida tu kesî. Ew pirr xort bû, lê dîsa jî tu kesî newêrîbû jê bipirsiya.
Arrelano bi awayeke bêçare got:
- Kî çi dizane, ew belkî kesekî pirr bi esil û rûhekî bi tena serê

xwe be. Ez nizanim, nizanim.
Ramos:
- Ew ne wek mirovên din e.
May Sethby:
- Ruhê wî pirr zuha ye. Ji bo wî tu ta'ma jiyanê nemaye. Ew wek termekî ye, lê dîsa jî bi qasî ku mirov lê ecêbmayî bimîne, li ser xwe ye.
Vera:
- Ew ji dojehê derketiye. Kesên ku li dojehê nemabin, nikarin weha bin û tew hîn zarok e.
Lê tev vê jî tu kesî nikarîbû jê hez bikira. Ew tu carî ne dipeyivî, nedipirsî û tu pêşniyar-mêşniyar jî nedikir. Ew bi rûyê xwe yê ku tu mane tê de xuya nedibû, li wir disekinî û guhdarî dikir. Dema ku ew di derheqa şoreşê bi dengekî bilind û bi heraret dipeyivîn, Rîvera jî ji bilî çavên xwê yên ku agirekî sar jê diçû, mîna miriyekî xuya dikir. Çavên wî yên tûj wek metqebek ji qeşayê, mirov diheyirand û dixist nava endîşeyê, ji rûyekî diçû ser rûyekî din û ji gotarvanekî diçû ser gotarvanekî din. Vera bi bawerî ji May Sethby re got:
- Ew ne ajan e. Ew welathezek e. Tu şupheya min ji vêya tuneye. Tiştê ku ez dibêjim, bila bê bîra te; ew ji me hemûyan bêtir welathez e. Ez vê dizanim, di dilê xwe û di mejiyê xwe de hîs dikim. Lê ez wî qet nas nakim.
May Sethby:
- Mîzaceke wî ya pirr ters heye.
Vera ricifî û got:
- Ez dizanim. Wî bi wan çavan li min nihêrî... Ew çav, ne çavên hezkirinê ne, mirov tehdît dikin, wek pilingekî dirinde dinihêrin.

Ez dizanim ku ez bi vê daweyê re îxanetê bikim, ew dê bêşik min bikuje. Dilê wî tuneye. Ew wek pola bêmerhamet û hişk û wek seqemê sert û sar e. Ew wek tava heyva şeveke sar ya zivistanî ku mirov li serê çiyayekî xalî ji sermayê diqefile, ye. Ez ne ji Dîaz û ne jî ji hemû qatilên wan ditirsim. Lê ev lawik, ez ji vî lawikî ditirsim. Ne henek e, ez bi rastî jê ditirsim. Ew wek nefesa mirinê ye.
Di gel vê jî yê kii ji bo ceribandina bawerî û dilsoziya Rîvera ya di kar de, yên din îkna kir, Vera bû. Wê demê xeta komunîkasyonê ya di nav Los Angelesê û Kalîforniyaya Jêrîn de hebû, hatibû qut kirin. Sê hevrayên wan di kozikên ku wan bi xwe kola bûn de, hatibûn gulebaran kirin û kozikên wan bûbûn mezelên wan. Du hevrayên wan jî li Los Angelesê, girtîyên Dewletên Yekbûyî bûn. Şêfê Federasyonê, Juan Alvarado yê ku şoreşger bi xwînê der dikirin, wek wehşekî bû. Hemû planên wan eşkere kiribû. Wan li Kalîfornîyaya Jêrîn nema dikaribûn , bi şoreşgerên aktîv û bi dilxwazên xwe yên ku nuh ketibûn nav rêxistinê re têkiliyan deynin. Ev wezîfe dan Rîverayê xort û ew ber bi başûr ve şandin. Gava ew vegeriya, xet hatibû çêkirin û Juan Alvarado hatibû kuştin. Ew di nav nivînê xwe de, bi kêreke ku heta ber destiyê wê di sînga wî de çikyayî hatibû dîtin. Vêya ji dervayî wezîfeya Rîvera bû, lê endamên Juntayê dizanîbûn bê di demên weha de, ew çawa bi lez bû. Wan tu tişt ji wî ne pirsîn û wî jî ji wan re tu tişt ne got. Lê wan li hevdû nihêrîn û ev ji çavên wî xwendin.
Vera:
Min ji we re gotibû. Dîaz divê ji zilamekî kal bêtir, ji vî xortî bitirse. Ew bê aman e. Ew destê xwedê ye. Ew şexsiyeta ku mirov ji

ber nikarîbû tehamul bikira ya ku May Sethby behsa wê dikir û ji çavên tu kesî nereviyabû, bi vî awayî derketibû ortê. Rîvera carna lêvçiryayî, hinarikên rûyê wî şînbûyî an jî bi guhekî werimî dihat. Ev pirr eşkere bû ku ev birîn, encamê pevçûna wî ya li wê devera ku lê radiza û dixwar, pere qezenc dikir û li wê dinyaya gelek karên ku endamên rêxistinê pênizanîbûn dikir, bûn. Piştî demekê, Rîvera
54

di rojnameya şoreşger ya ku ji hefteyê carekê derdiket de, dest bi karê tîpografiyê kir. Carinan weha dibû ku wî nikarîbû tîp rêz biki-rana. Tiliyên wî yên girdikê û destên wî ewqas eciqî û êşiyayî bûn ku wî nikarîbû wan tev bilivanda. Milekî wî bi kêleka wî ve daliqi-yayî bû û rûyê wî jî ji ber êşeke ku nayê gotin defbrme bûbû.
Arrellano got:
- Tu ji min bipirse; ev serseriyekî dera hanê ye.
Ramos:
- Ew diçe deverên xerab.
Vera pirsî:
- Baş e, lê gelo ew pera ji ku peyde dike? Li min binihêrin, li gor ku min nuh bihîst; wî hîn îro ji bo heqê kaxizên rojnameyê sed û çil dollar daye.
May Sethby:
- 0 dû re awayê wî yê wendabûnê. Ew tu carî behsa ku bi ku de diçe, nake.
Ramos pêşniyarek avêt ortê:
- Em divê yekî bi dû wî de bişînin.
Vera:
- Ez tu carî naxwazim, di sûna wî kesê ku dê wî taqîb bike de

bim. Ez ditirsim ku ji dervayî dema ku hûn min têxin mezel, hûn dê tu carê din nikaribin rûyê min bibînin. Mirov xofe ji vî lawikî digre. Ew dê tu carî destûra ku xwedê di nava wî û hedefa xezeba wî keve, nede.
Ramos li xwe mikur hat û got:
- Ez çi derewa bikim, ez xwe li hember wî wek zarokekî dibînim.
Arrellano:
- Ez ji we re tiştekî bibêjim; ji bo min, ew îrade û quwet bi xwe ye. Ew dehbeyek e; gurê dirinde ye; marê mirdarok e; tûpişkê ku bi mirov vedide ye.
Vera:
- Ew di şexs de muşaxesbûna şoreşê ye. Rûh û agirê şoreşê ye. Ew
55

daxwazeke heyfa bêpîvan ya ku bi bêdengî lê dbce ye. Ew milyaketê wêrankirinê yê ku di bêdengiya şevê de difire ye.
May Sethby bi dilovaniyeke mezin got:
- Dilê min bi wî dişewite. Kes tu nêzîkbûnê nîşanî wî nade. Ew ji herkesî nefret dike. Ew me tercîh dike, ji ber ku em û ew ji bo eynî armancê dixebitin. Ew bi tena serê xwe ye... tikî tenê.
May Sethby kelogirî bû, dengê wê hate birîn û hêsir ketin çavên wê. Awayê jiyana Rîvera û wextên wî yên çûyin û hatinê, bi temamî nihênî bûn. Carinan hefteyek derbas dibû jî wan rûyê wî nedidîtin. Carekê ew mehekê xuya nebûbû. Lê gava ku ew vedigeriya, bêî ku tu peyv ji devê wî derketa, pereyên zêr datanî ser maseya May Sethby. Carinan jî bi rojan, bi hefteyan li ba Juntayê dima. Lê di wan deman de jî di saetên cîhê de diçû derve. Ji serê sibehê heta derengê şevê, li ortê xuya nedibû. Şevekê Arrellando wî bi destên

werimî û bi lêva çiriyayî ya ku hîn jî xwîn jê dihat, dîtibû. Ew wê gavê li çapxaneyê dixebitî. Dem hatibû. Qedera şoreşê bi Juntayê ve hatibû girêdan. Lê Junta bi xwe di rewşeke zor de bû. Ihtiyaca wan ya ji pereyan ji her wextê bêtir bû. Lê peydekirina pereyan jî ji her wextê zortir bû. Welathezan senta xwe ya talî jî dabûn û êdî tu tiştê ku wan bikariba bidana, nemabû. Grûpên karkerên çandiniyê-karkerên rojê yên ku ji Meksîkayê hatibûn- nêviyê wê piçika heqê xwe yê rojane didan şoreşê. Lê vêya têr nedikir û ihtiyacî bi pereyên zêdetir hebû. Ew xebata dijwar ku bi salan dihate meşandin, tu nema bû ku ber bida. Dem stewyayî bû. Şoreş li ser tayekî pora mabû. Dehfdaneke talî ber bi pêş de, hewildaneke bi mêrxasî... ûdû re mîlê nîşanderê dê serkevtin nîşan bida. Wan Meksîkaya xwe baş nas dikirin. Piştî ku şoreş dest pê bikira, êdî dê bi xwe belav biba. Hemû sîstema Dîaz dê wek qesra ji kaxizan bi erdê re bûbûya yek. Herêmên nêzîkî hudûd ji bo serîhildanê amade bûn. Yankiyek bi sed zilamên bi riza xwe, ji bo derbasî aliyê din yê hudûd bibin û Kalîfornîyaya Jêrîn îstila biltin amade bûn. Lê pêwîstiya wî bi tivingan hebû. Têkiliyê Junta li her derê welêt, heta bi Atlantîkê bi gelek

56

mirovan re hebû û pêwîstiya hemûyan bi sîlehan hebû. Macerapêrest, lyckoriddare haydût, karkerên Amerîkayê, sosyalîst, anarşîst, şerkir, penaberên Meksîkî, karkerên çandiniyê yên ku ji ber esaretê reviyabûn, karkerên madenê yên ku li Coeur d'Alene û Colorado di îşkencexaneyan re derbas bûbûn û bi daxwaza heyfê dikelin... Bi kurtî hemû kesên ji binê civakê û hemû elemanên tevlihev yên dinya hevçax li bende sileh û cepxaneyan bûn û hemûyan bang dikirin: Tiving û cepxane, cepxane û tiving! Ger ev koma mirovên ku bi hî-

sên heyfstendinê dikelin û difûrin, hudûd derbas bikin, tê wê maneya ku şoreşê dest pê kiriye. Berê deriyên bakur yên hudûd û avahiya gumrukê têketa destên wan. Dîaz nikarîbû li hember vêya rawestiya. Dîaz dê cesaret nekira û ordiyên xwe neşanda ser wan. Ji ber ku wê mecbûrî paraztina hêla başûr bûba. Lê tev hemû tiştî, agirê şoreşê dê ji başûr belav biba. Gel dê serî hilda. Dê bajar bi dû bajar, sîlehên xwe danîna û hemû eyalet dê yek bi yek biketana û ala teslîmiyetê rakirana. Û di talîyê de, ordiyên qehreman yên şoreşê dê ji herçar aliyan êrîşî keleha Dîazî herî talî, bajarê Meksîko bikirana. Lê kar bi pereyan diqediya. Mirovên wanî ji dil û bi hewes yên ku tiving bikar bianîna hebûn. Wan tucarên ku dê sîleh bifrota û teslîmî wan bikira jî nas dikirin. Lê xebata amadekirina şoreşê hemû îmkanên Juntayê daqurtandibû. Dollarê herî talî hatibû xerc kirin, îmkana herî talî hatibû bikar anîn û welathezê herî talî yê birçî jî zuha bûbû. Lê şoreş li ber devê derî bû. Sîlah û cepxane! Ordiyên gel diviyabû çekdar bûba. Lê çawa? Erdên Ramos yên ku dest danîbûn ser, dihate bîra wî. Arrellano ji ziyankeriya ku di xortaniya xwe de kiribû, sixêfdikirin. May Sethby bi pirsa ku ger Junta hebekî destê xwe bigirta, gelo dê rewş ne guhertî ba, meşgûl bû. Paulîno Vera: bifikirin, azadiya Meksîkayê bi çend dollarên pîsik ve girêdayî ye. bifikirin! Bêçaretîyekê xwe bera ser rûyê hemûyan dabû. Hêviya wanî talî yê ku karîbûn berê xwe bidanayê, Jose Amarillo yê ku soza pereyan dabû wan jî li Chihuahuayê, li mala xwe hatibû girtin û Ji ber dîwarê êxur gulebaran bûbû. Wê gavê Rîverayê ku milên xwe
57

yên vemaltî di ava qirêjî de dakiribû û erd paqij dikir, firçe sekinand, serê xwe rakir û pirsî:

- Ma pênc hezar têr dike?
Hemûyan bi şaşmayî li hevdû nihêrîn. Vera xweziya xwe daqurtand û di maneya "erê" de, serê xwe hejand. Ew nema karîbû bipeyiviya. Lê hîseke baweriyeke xurt ketibû hundurê wî. Rîvera:
- Wê gavê sîparîşa sîlehan bidin.
Dû re axaftina xwe ya herî dirêj ya ku heta wê rojê tu carî nehatibû kirin, kir:
- Wext pirr teng e. Di hundurê sê hefteyan de, ez dê pênc hezaran ji we re bînim. Heta wê gavê hewa jî hêdî hêdî germ dibe. Ji xwe ez nikarim hîn zûtir peyde bikim.
Vera bi hîsa baweriya xwe ya ku ji ber vê yekê çêbûbû re şer dikir. Mirov nikare bawer bike! Ji wê roja ku kete nav şoreşê û heta nuha, gelek hêviyên giranbiha wenda bûbûn. Wî baweriya xwe bi vî lawikê paqijkerê şoreşê tanî, lê ev mesele nediket serê wî û ji ber vê jî newêrîbû bi rastî bawer bike:
- Tu dîn e!
Rîvera:
- Piştî sê hefteyan. Sîparîşa tivingan bidin.
Rabû ser xwe milên xwe yên vemattî rast kir û çakêtê xwe li xwe kir û got:
- Hûn sîparîşê bidin. Ez nuha diçim. Piştî bazdana bi vir de û wê de, pevçûn, liberhevdan û xeberdanên bi telefonan, bi şev li buroya Kelly civîneke hat çêkirin. Karê Kelly pirr bû. Wextê wî yê ku serê xwe bixuranda jî tunebû. Ew xemgîn bû, kêfa wî ne lê bû. Wî ji bo maçeke boksê bi Bill Carthey re, Danny Ward ji New Yorkê anîbû. Ji roja maçê re sê hefte tenê mabûn. Lê karê wî rast nemqiyabû û Billy Carthey birîndar bûbû. Birîna wî giran bû. Ev du ro-

jên wî ne ku ew di nav nivîna de ye û xwe ji hemû nûçegîhanên sporê veşartibû. Tu kesê ku têketa cîhê wî tunebû. Kelly bêî rawestîn, telegraf da hemû kesên ku di sîkleta sivik de hatin bîra wî, lê

58

yek ji wan jî ne vala bû û bi kontraktên xwe ve girêdayî bûn. Hêvî nuha ji nû ve diçûrisî. Tam nediket serê wî, lê qels bûya jî hêviyek xuya dibû. Dema ku hatin hember hev, Kelly li Rîvera nihêrî û paşê got:

- Ez bala xwe didimê ku tu pirr cesûr î.

Çavên Rîvera ji nefreteke bi jahr dibiriqandin, lê tu guhartin tê de çênebû û tenê weha got:

- Ez dikarim zora Ward bibim.

- Tu vê çawa dizanî? Te ew di dema maçê de tu carî dîtiye?

Rîvera serê xwe di maneya na de kil kir.

Kelly got:

- Ew dikare çavgirtî û bi destekî zora te bibe.

Rîvera milên xwe hejandin. Kelly bi awakî sert jê pirsî:

- Ma hemû tiştên ku tu ê bibêjî, ev in?

Rîvera:

- Ez dikarim zora wî bibim.

Li ser vê Michael Kelly got:

- Ez meraq dikim, gelo tu dikarî zora tu kesî bibî?

Michael birayê tertîpkarê maçên boksê bû û buroya bişertlîstinê ya ku navê wê "Yellowstone" bû, birêve dibir. Wî li wê derê, ji bi-şerdîstina li ser boksê gelek pere qezenc kiribû. Rîvera ji dêlba ber-sivê, bi awireke sert û tijenefret li wî nihêrî. Sekreterê tertîpkar mi-rovekî xort û tîpekî sportmen bû. Ew bi qerf keniya. Kelly bi axafti-na xwe, ew hewa nedostane belav kîr:

- Ka bisekine, tu Roberts nas dikî. Min şand pê wî, ew divê nuha

li vir bûya. Rûne û li bende be. Tu ji min bipirsî; tu şensa te ya bi-
serketinê tuneye. Ez nikarim bi maçeke basît, henekê xwe bi tema-
şevanan bikim. Weke ku hûn jî dizanin, cîhên herî nêzîkî rîngê, bi
panzdeh dollara ye.
Dema Roberts hat, serxweş bû. Ew yekî zirav, dirêj û zeîf bû.
Axaftina wî jî wek meşa wî ya sist û bêruh bû.
Kelly raste-rast ket nav meseleyê:
59

- Guhdarî bike Roberts; tu dipesinî û dibêjî ku min
ev zarokê
Meksîkî derxistiye ortê. Wek tu dizanî, Cardiey milê xwe şikenan-
diye. îro jî ev lawikê hanê rabûye, hatiye vira û bê fedî dibêje ku ew
dbcwaze têkeve şûna Carthey. Tu ji bo vê çi dibêjî?
Roberts serê xwe hêdî hêdî kil kir û got:
- Ev baş e, Kelly. Ew dikare baş boksê bike.
Kelly bi awayekî hêrsbûyî ji nişka ve got:
- Û dû re belkî tu dê bibêjî ku ew ê zora Ward bibe.
Roberts hebekî fikirî:
- Na , ez vê nabêjim. Ward rêviyekî rîngê ye û ew li kê bide,
wan li erdê rast dike. Lê ew nikare weha bi hêsanî zora Rîvera bibe.
Ez Rîvera nas dikim. Ew ne pariyekî hêsan e. Min tu carî nedîtiye
ku ew tirsiya ye. 0 hutuka wî ya çepê bi qasî ya rastê sert e. Ew di
kîjan pozisyonê de be bila biba, dîsa jî dikare derbên pirr xurt bi-
avêje.
Kelly:
- Ev tiştekî din e, vana bihêle. Ma gelo ew dikare bala temaşeva-
nan bikşîne? Te di hemû jiyana xwe de, boksvanên bêhejmar gî-

handiye. Ya rastî, ez serê xwe li ber tiştê ku tu dê bibêjî, ditewînim. Ma ev li hember pereyên temaşevanan, hêja ye, ne hêja ye?
Roberts:
- Belê ew dikare, çawa nikare! Bila tu şika te jê tunebe ku ew dê baş zorê bide Ward. Tu vî lawikî nasnakî, lê êz nas dikim. Min ew keşif kiriye. Tu pirîskeke tirsê jî pê re tuneye. Ew şeytanek e. Ger tu dixwazî pê bihesî, ew hosteyekî temam e. Ew dê wisa li Ward bixe ku devên we dê vekirî bimîne û ji ber hebûna qabiliyeteke weha ya li vî bajarî, hûnê giş şaş bimînin. Ez naxwazim, bibêjim ku ew dê zora Ward bibe. Lê ew ê maçeke weha bilîze ku hûnê bi rastî fahm bikin ku ew stêrkek ber bi bilindbûne ve diçe ye.
Kelly berê xwe da sekreterê xwe û got:
- Temam, baş e. Telefonê Ward re veke. Min jê re gotibû, ez ye-
kî ku îdare bibe peyde bikim, ez dê bişînim pê te. Nuha ew li Yel-
60

lowstoneyê fiyaqê dike.
Kelly dû re vegeriya ser meşqker:
- Tu dê tiştekî vexwe?
Roberts dema highballa xwe(wîskiya bi soda)ta'm kir û daqur-
tand, dest bi axaftine kir:
- Min tu carî ji we re negotiye ku bê min ev lawik çawa keşif ki-
riye. Ew çend sal berê hatibû salona meşqkirinê. Min Prayne ji bo maça ku wê bi Delaney re bikira, dixebitand. Prayne dîn e. Tu merhamet pê re nîne. Ew li hember hevalên xwe yên antremanê bê însaf bû; mirov bihişta, wî dê wan perçe bikirana. Ji ber vê, min tu kesê ku bixwazta bi wî re bixebitiya, nikarîbû peyde bikira. Min lê nihêrî ku ev lawikê Meksîkî yê birçî li wê derê sekinî ye. Ez jî di

rewşeke pirr xerab de bûm. Min ew girt, lepik xistin destên wî û wî ajot rîngê. Ew wek çerm saxlem bû, lê zeîf bû. Wî di derheqa bin-gehên destpêkê yên boksê de, tu tişt nizanîbû. Prayne ew perîşan kir. Wî du raundê ecêb, îdare kirin. Dû re, dilê wî ji bîr çû. Lê dilê wî ji birçûbûna, ji bîr çûbû. Ma lêxistin xwaribû? OfF, lêxistineke weha xwaribû ku nedihat naskirin. Min nîv dollar da wî û zikê wî jî tam tije kir. Dema ku xwarin dixwar, divê we bidîta bê çawa çelp çelpa devê wî bû. Ev çend roj bûn ku tu tişt di qirika wî re neçûbû xwarê. Min digot, êdî ew dê nema li van derana xuya bibe. Lê roja pê wê re, ew tev devûrûyê xwe yê perîşanbûyî dîsa hat. Ew bi nîv dollarî û xwarinê ve qayil bû. Ew her ku diçû baştir dibû. Ew tiştekî ecêb zexm e û ji dîya xwe boksor ketiye. Tu hîsên wî tunene, wek perçeyekî qeşayê ye. Ji dema ku min wî naskiriye û heta nuha, wî tu carî deh gotin li dû hevdû negotine. Ew tiştê ku divê bê kirin, dike û hem jî pirr baş dike.
Sekreter got:
Min wî li ba we dîtibû. Ew li ba we pirr xebitî.
Roberts bersiv da:
- Ew bi hemû elemanên minî herî qenc re xebitî. 0 ew gelek tişt ji wan fêr bû. Wî dikarîbû zora hinekan ji wan bibira. Lê wî tu carî
61

ji dilê xwe û bi riza xwe, ev kar nedikir. Wî ji boksê qet hez nedikir. Lê weke ku hez dikir, dida xuya kirin.
Kelly got:
- Ger ez ne şaş bim, wî di van mehên dawî de, li klûbên piçûk boks dikir.
Roberts:

- Belê. Lê ez nizanim, bê çi bi wî hatiye. Damarê wî yê boksortiyê rabûye, çi ye. Ew wek firtineyekê derdiket ortê û hemû bolcsorên mezin yên mehellî, li erdê rast dikirin. Weha xuya bû ku wî dixwast pera qezenc bike û tev ku ev ji kincên wî diyar nabe jî wî gelek pere dan hey. Mirovekî ecêb e. Kes nizane, bê ew çi karî dike. Kes nizane, bê ew wextê xwe çawa û li kî derê derbas dike. Gava ku ew di beşa sporê de jî dixebite, her roj piştî qedandina kar wenda dibe. Ew carinan çend hefteyan li ser hev xuya nabe. Lê ew guh nade nesîhetan. Ew zilamê ku menacertiya wî bike, dê serweteke mezin bidest bixe. Lê ew qet li vê nafikire jî. 0 divê hûn dilxwaziya wî ya di warê pereyên pirr de, bibîne, wê gavê mirov dikare şertê xwe yê peymanê pê bide qebûl kirin.
Di wê esnayê de Danny Ward ket hundur. Wek sahneyeke tiyatroyê bû. Menacer û meşqkerê wî jî pê re bûn. Danny bi nezaket û dostane, wek bayekî ket hundur. Silav li yên dora xwe kir, henekek bi vîya kir, henekek bi wîya kif; li vir nihêrî, li wir nihêrî; bi her kesî re, yek bi yek bişirî. Adeta wî weha bû, di van tevgerên wî de, tenê heta dereceyekê samîmiyet hebû. Ew aktorekî baş bû û pê dizanibû ku ji bo mirov bikaribe li-vê dinyayê bigihîje derekê, nezaket û xwe şinnekkirina bi her awayî, şert e. Lê ew di hundurê xwe de, boksorekî bihesab, xwînsar û tucar bû. Tiştên din, maske bûn. Yên ku wî nas dikirin, an yên ku pê re didan û distendin dizanîbûn ku ew bi tenê li menfaeta xwe difikire. Ew di hemû bazariyan de hazir dibû û li gor hihekan jî menajerê wî ji navberkekî pê ve ne tu tiştek bû; wî menajerê xwe li ser tilîka xwe dida lîstin. Lê rewşa Rîvera bi temamî guhertî bû. Di damarên wî de, hem xwîna çermsora(indîan) 6%

û hem jî ya spanyola digeriya. Ew bê deng û bê livandin, li qunci-
kekê xwe dabû erdê. Lê çavên wî yên reş li ser wan yek bi yek dige-
riyan û bi awayê ku dixwaze bê çi di hundurê wan de heye bixwîne,
bala xwe dida hemû tiştan.
Danny got:
- Ne xwe, hezret ev e, ha?
Danny raqîbê xwe, bi çavan pîva û dû re dewam kin
- Çi heye, çi tuneye, kurikê piçûk'
Çavên Rîvera bû wek du bizotên êgir, lê tu bersiv nedayê. Wî ji
hemû biyaniyan, ji hemû Angloamerîkanan nefret dikir. Lê gava
çavên wî bi vî zilamî ket, di hundurê xwe de, ji nişka ve nefretek ku
her diçû bilind dibû, hîs kir.
Danny bi awakî bi qerfgot:
- Hey xwedêyo! Ez hêvî dikim, tê nexwaze ku ez bi yekî kerr û lal
re maçê bikim?
Dema pixkînî sekinî, wî dîsa dest pê kir:
- Qey Los Angeles xera bûye ku we çû vîya peyde kir. Gelo we
ew ji kîjan zarokxaneyê aniye?
Roberts Rîvera parazt û got:
- Danny, ji vê bawer be ku ev lawikekî pirr jîr e. Tu weha li ner-
mikbûna wî nenihêre, ew qet ne nerm e.
Kelly li ber geriya û got:
- Ez heyrana çevên te bim Danny, nêviyê bilêtan hatine firotin.
Em çawa bikin, me yekî jê baştir nedît. Tu divê qîma xwe pê bînî,
ev ji tunebûnê çêtir e.
Danny dîSa li Rîvera nihêrî, keserek kişand û got:
- Divê ez lê miqate bim da ku bi derba yekem re, li erdê rast ne-
be.

Robert bi kerb, kir ufe-uf. Menajerê Danny bala wî kişand:
- Tu divê çavên xwe baş veke. Gava mirov bi yekî re cara yekem derdikeve maçê, bi şensa xwe ya baş bawerbûn, têrê nakê. Tê lê binihêre, tevli hertiştî jî belkî ew bikaribe hutukeke bi îsabet bavêje.
63

Danny bişirî û got:
Meraqa nekin, ezê çavên xwe baş vekim. Ezê bi destpêkê re, hakimiyetê bistînim û dû re ezê ji bo kêfa temaşevanan, bi wî bilîzim. Ma panzdeh raund bes in, Kelly? 0 dû re naqawt(knockout)?
Ger tu weha bikî ku bişibe rastiyê, bes e.
- 0 nuha emê bên ser bazarê.
Danny bê deng hesab kir.
- Bê şik, wek hesabê me û Carthey, ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî. Lê divê parvekirin guhertî be. Ez bi ji sedî heyştêyî qayil im.
Dû re vegeriya ser menajerê xwe û got: - temam? Menajer serê xwe, di maneya erê de kil kir. Kelly ji Rîvera pirsî:
- Ma te fahm kir?
Rîvera serê xwe kil kir. Kelly dest bi îzahatê kin
- Mesele weha ye; para boksoran ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî ye. Tu yekî ne naskirî ye û ne hatiye ceribandin. Tu û Danny divê vêya li hevdû parve bikin; para te, ji sedî bîst û ya Danny jî ji sedî heyştê ye. Ev parvekirineke li gor heqiyê ye, ne werê Roberts?
Roberts tesdîq kir û got:
- Ev bi temamî durust e, Rîvera. Ev ji ber ku hîn kes te nas nake, weha ye.
Rîvera:
Ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî, çi qas dike?

Danny:
- Belkî pênc hezar, belkî heyşt hezar, tiştekî li wê dorê. Para te jî nêzîkî hezar-hezar û şeş sedî dike. Ev ji bo lêdaneke baş ji boksorekî mîna min, pereyekî ne xerab e. Ma ne weha ye?
Rîvera bersiveke weha da ku herkes lal mabû:
- Kî zora kê bibe, bila hemû pere yên wî bin.
Civat ket nav bêdengiyeke kûr.
Menajerê Danny:
- Ev, wek mirov şekirê zarokekî piçûk jê bistîne ye.
Danny aciz bû û serê xwe kil kin
64

- Ev demeke dirêj e ku
ez di nav vî karî de mim. Ez tu siyê ne
dixim ser hakemê rîngê û ne ser van kesên hazir. Ez dê behsa maçên lihevkirî û hinek dek û dolabên carinan tên kirin, nekim. Lê tiştê ku ez dibêjim, ev e; derketina maçeke weha ne li gor min e. Ez ji serkevtina xwe baş bawer im; mesele ne ev e. Lê bifikire ku destê min şikest, ma ne weha? An jî yekî dilnexwaz dikare min bixapîne û tiştekî ku laşê min sist bike bi min bide vexwarin.
Danny serê xwe bi awayekî jixwebawer kil kir û pirsî:
- Ez qezenc bikim jî wenda bikim jî para min ji sedî heyştê ye.
Tu ji vê re çi dibêjî, Meksîkiyo?
Rîvera serê xwe, di maneya "na" de kil kir. Danny wextî biteqiya.
Li vê derê, êdî blofderbas dibû.
Danny got:
- Way Meksîkîyê ser reş û ehmaq! Ez dikarim ji nuha de dev û bêvila te tije xwîn bikim!

Roberts kete orta wan. Tu guhertin di rûyê Rîvera de çênebû, înada xwe domand û gotina xweya berê tekrar kir:
- Kî bi serkeve, bila hemû hatin ji wî re be.
Danny pirsî:
Tu vêya ji bo çi dixwazî?
Bersiva Danny weha hat dayin:
- Ji ber ku ez dikarim zora te bibim.
Danny bi hêrs dikira çakêtê xwe ji xwe bikira. Lê menajerê wî dizanîbû ku ew vêya ji bo çavtirsandinê dike. Çaket li ser Danny ma û Danny bi ya wan kesên ku li ber wî digeriyan kir. Hemûyan aliyê Danny digirtin. Rîvera bi tena serê xwe bû.
Kelly:
- Li min guhdar bike, dîno. Tu bi çi çavî li xwe dinihêrî, tu ne tiştek e! Temam, me fahm kir ku ev çend meh in ku tu zora bolcsorên deverî dibe. Lê Danny boksorekî ji sinifa yekem e. Ew piştî vê maçê, dê ji bo şampiyontiyê bilîze. 0 kes te nas nake. Ji dervayî Los Angelesê, tu kesî nebihîstiye ku behsa te hatiye kirin.
65

Rîvera milên xwe hejand û got:
- Piştî vê maçê, dê kesê ku min nas neke, nemîne.
Danny bang kin
- Ma gelo tu dikarî ji bo saniyeyekê bi tenê jî xwe îkna bike ku tu dê karibe zora min bibî?
Rîvera di maneya "erê" de, serê xwe kil kir.
Kelly li ber wî geriya û got:
- Ka were hişê xwe bide serê xwe û li min guhdar bikî. Serê xwe hebekî bisuxulîne, ev maç dê ji bo te bibe reklameke pirr mezin. Rî-

vera qut birî: - Ez pereyan dixwazim, tu tiştekî din naxwazim.
Danny bi şêweyeke ji xwe ewle got:
- Tu çend tenûr nan bixwî jî, tu dê nikaribe zora min bibî.
Rîvera pirsî:
- Ger weha be, tu ji bo çi îtîraz dikî? Ger tu ewle be ku tu dê zora min bibî û pereyan di çenteyê xwe xe, tu ji bo çi zehmetiyê derdixî?
Danny:
- Baş e kero! Tu dê henekê xwe bi min bikî ha! Ez dê di rîngê de te perçe bikim. Kontraktê amade bike, Kelly. Yê ku bi serkeve dê hemû pereyan bistîne. Vê xeberê bighînin rojnameyên sporê; bêjin ku ev dê maçeke mirin û fnayinê be. Bila ev kur bizanibe bê dinya çawa ye.
Dema sekreterê Kelly tam dest bi amadekirina kontraktê kir, Danny ew sekinand û berê xwe da Rîvera û pirsî:
- Ya wezinandin?
- Beriya ku em derkevin rîngê.
-Na na dosto, madem yê ku bi serkeve dê hemû pereyan bistîne, bila wezinandin jî sibehê saet di dehan de bibe.
Rîverapirsî:
- Yê bi serkeve hemû pereyan distîne?
Danny di maneya erê de serê xwe kil kir. Ev mesele jî temam bû-bû. Ew dê tam di dema ku herî xurt ba, derketa rîngê.
Rîvera got:
66

- Wezinandin di
saet dehan de. Sekreter nivîsandina xwe do-
mand.

Roberts ji Rîvera re, bi gazinî got:
- Ev tê maneya du kîlo û nîv zêdebûnê. Te gelek tawîz dan. Te maç ji destpêkê de wenda kir. Danny dê bi qasî ciwangayekî xurt be. Tu dîn e. Ew dê ji sedî sed zora te bibe. Tu şanseke te ya piçûk jî tuneye.
Bersiva Rîvera nerîneke tije nefret bû. Wî nefret dikir. Wî dizanîbû ku vîyê biyanî, di nav wan de yê herî durust e. Lê tev vê jî Rîvera ji wî jî nefret dikir.
Derketina Rîverayî rîngê hema hema qet tu bal nekişandibû. Bi tenê çend çepikên pirr qels silav li wî kiribûn. Çavên temaşevanan ji wî ne dibirîn. Wan bi çavên ku ew dê wek zarokekî di nav pencên Dannyê mezin de, bê serjêkirin didît. Ji xwe temaşevan xeyalşikestî bûbûn. Wan hêviya şerekî dijwar yê ku dê di navbera Danny Ward û Billy Carthey bûbûya dikirin. Lê nuha divê ji mecbûrî, qîma xwe bi vî lawikê rebenî nuhdestpêkirî binin. Nîşanên hisên ji ber vê guhertinê, di mesela bi şerdîstinê de eşkere dibû; li ser Danny, li hember yekê, bi duduyan heta bi sisiyan şert digirtin. Ji ber ku temaşevanê ku bi şert dilîze, pereyên xwe li ser wî kesê ku dilê wî jê re dixwaze û bawer dike ku ew dê bi serkeve, radizîne. Yê Meksîkî li quncikê rûniştîbû û dipa. Zeman derbas nedibû. Danny wî li wê derê disekinand. Ev lîstikeke kevn bû. Lê li ser boksorên nuh, hertim tesîreke mezin dikir. Dema ku ew weha di quncikê de, bi taswasa xwe û bi temaşevanan re tenê diman, tirsek diket dilê wan. Lê vê carê ev lîstik bi ser neketibû. Roberts rast digot. Rîvera destûra tirsê neda. Bi rastî jî di Rîvera de, tu asab-masab tunebû. Rîvera li gor kesên ku di emrê wî de bûn, ziravtir û zeîftir bû. Ev atmosfera ku di destpêkê de mirov têk dibe, qet tu tesîr lê ne kir. Alîkarên wî biyanî bûn. Ew, kes in ku ji tu tiştekî re nedibûn û ne hêja bûn

pênc pera. Ew rebenên rîngê yên bêheysiyet û bêenerjî bûn. Quncika wan, quncika wendakirinê bû. Di vî warî de tu şikek wanî piçûk jî tunebû.
Spider Hagerty bala Rîvera kişand û got:
- Divê tu bi dîqet be.
Spider serekalîkarê wî bû.
- Heta ku ji te bê, maçê dirêj bike... Kelly dixwaze ku tu weha bikî. Ger tu weha nekî, rojname dê bibêjin, ev maç, maçeke ku berê li ser Jiatiye li hevkirin e. Bi vî awayî, li hemû Los Angelesê dê sempatiya ku ji bo vê sporê heye, kêm bibe.
Ev gotin, gotinên hêvî şikenandinê bûn. Lê Rîvera qet guh nedida van gotinan. Wî ji hemû maçên boksê yên ku ji bo xatirê pereyan çêdibin, hertim nefret dikir. Ji bo ku ji birçîna nemire, ketibû vî karî. Ew li lokalên meşqkirinê, bûbû qurmê derban yên ku mirov pê meşqê dike. Laşê wî ji bo boksê, mukemmel bû. Lê wî bala xwe nedida vêya jî. Her çi dibe, bila bibe, wî ji boksê nefret dikir. Beriya ku ew têkeve nav Juntayê, ji bo xatirê pereyan boks dikir û wî dizanîbû ku mirov di vî meslekî de, pirr rehet pera qezenc dike. Û ew, ne ew kesê yekem bû ku di vî meslekê ku jê nefret dikir de, bi ser diket. Wî guhneda hîsên xwe. Her çi diba, bila biba, diviyabû ev maça qezehc bikira. Netîceya maçê divê ne bi awayekî din ba. Li pişta wî, hêzên mêzin yên ku ev qelebalixa ku li vê derê ye, tu carî nikare xeyal bike, hebûn. Sebeba vê baweriyê jî ev hêz bû. Danny Ward ji bo pereyan û ji bo jiyaneke xweş ya ku bi rêya pereyan tê, şer dikir. Lê tiştê ku Rîvera ji bo wê şer dikir, ew tiştê ku di mejiyê wî dikeliya, bû. Dema ku ew tenê li quncika xwe rûniştibû û li ben-

de raqîbê xwe bû, hemû tiştên ku wî diajot ser şer, di ber çavên wî yên wek bizotên êgir re derbas dibûn. Wî ew fabrîkeyên li Rio Blanca yên ku dîwarên wan spîkirî û bi quwweta avê dixebitîn, anî ber çavên xwe. Wî şeş hezar karkerên birçî û rengavêtî û zarokên piçûk yên heft-heyşt salî ku ji bo di rojê de deh Senta bistîne, xwe diperitandin, didît. Wî ew kesên ku di boyaxaneyan de, emrê xwe
68

dirizandin, ew cenazena didîtin. Hat bîra wî ku bavê wî, navê wan boyexanan kiribû "şikeftên întîxarê". Li wê derê salekê mayin, dihat maneya mirinê. Dû re, malên wan yên ku weke qutiyan bûn û dema tev wê jî ku diya wî wext didît û pê şa dibû, bi bîr anî. Û bavê wî hat ber çavê wî; bi sîngeke fireh û mezin, bi boqê simbêlan û ji herkesî qenctir û delaltir. Dilê wî ewqas fireh bû ku ew hezkirina ku di dilê wî de hilnedihat hem têra diya wî dikir û hem jî têra Muchachoyê piçûk yê ku li kêlekekê dileyizt dikir. Wê demê navê wî ne Felipe Rîvera bû. Navê wî ji ber navê dê û bavê, Fernandez bû. Wan bi navê Juan bangî wî dikirin. Dû re, dema dît ku komîserê polîsan ji navê Fernandez nefret dike, wî bi xwe navê xwe guhert. Hey Joaquin Fernandezê mezin û dilovan! Wî di bîranînên Rîwera de cîhekî mezin digirt. Wê gavê hişê wî baş nedigihastê û fehm nedikir. Lê nuha, dema ku ew li derbasbûnê fikirî, fahm dikir. Bavê wî hat ber çavên wî; li wê matbaeya piçûk herf dixistin rêzê an jî li ser maseya ku tiştên li ser wê tevlihev, nivîsên ku dawiya wan qet nedihat, dinivîsand. Wî karkerên ku di tariya şevê de, mirov di got qey sûc kirine bi dizî dihatin mala wan û bi bavê wî re diketin nava munaqeşeyên dûr û dirêj, bi bîr anî. Û wê gavê Muchachoyê ku li qoziyê radiza jî hertim ne di xew de bû. Bi dengê

Spider Hagerty ji xeyalan şiyar bû.
Hagerty:
- Hema tu bi carekê xwe li erdê rast neke û maxlûb nebe ha. Talîmat weha ye, lêxistina xwe bixwe û pereyên xwe bistîne.
Deh deqîqe derbas bûbûn û Rîvera hîn jî li qoziya xwe rûniştîbû. Danny li ortê nexuyabû. Xuyabû ku dê hîleya xwe bi qasî ku bikariba dirêj bikira. Di vê navbeynê de, hinek xeyalên din hatin ber çavên Rîvera. Lokavta ku ji ber greva ji bo piştgiriya karkerên ku li Pueblayê di grevê de bûn, li hember karkerên ji Rio Blancoyê dihat bikar anîn... Birçîbûn... Ew gîha û kokên nebatan yên ku ji serê çiyan berhev dikirin û dixwarin û herkes pê nexweş diket...Dû re ew kabûsa... Ew saha vala ya ku li ber ambarên şîrketê, karkerên birçî
69

yên ku hejmara wan digihast hezaran û leşkerên Porfirio Dîaz... Ew agirê ku ji tivingên kesên ku dixwest greva piştgiriyê ya karkeran bi xwînê bifetisîne, derdiket û mirin vedirşiya... 0 ew şeva hanê!.. Vagonên berê xwe dabûn Vera-Cruzayê heta ber dev bi termên ku dê ji segmasiyan re bibin adan dagirtî... Derketina wî ya ser terman û di nav wan termên ku mûyên laşê mirov gij dikirin de, li dê û bavê xwe gerîn û dîtina wan wek îro dihat bîra wî... Tew dîya wî pirr baş dihat bîra wî... Laşê wê di bin termên din de wenda bûbû, çûbû. Bi tenê rûyê wê xuya dibû. Dema ku tivingên firotî yên Porfirio Dîaz dîsa dest bi gulebaranê kiribûn, wî xwe dîsa avêtibû erdê û wek çûkê ku ketibû feqê terpilîbû û ji wir bi dûr ketibû. Dengekî ecêb wek dengê pêlên deryayê hat guhên wî. Bi dû wê re, di nav keriyek alîkar de, Danny ward xuya bû. Hemû kesên ku di salonê de bûn, ji bo qehramanê navdar yê ku serkevtina wî ji nuha de xuyabû, li

çepikan dixistin. Herkesî navê wî bang dikir û herkesî piştgiriya wî dikir. wekî din jî dema ku Danny di nav benan re bi fiyaqe derbas bû û derket rîngê, devên alîkarên Rîvera jî ji hev mabûn. Kenekî pirr comert xwe bera ser rûyê Danny dabû. Dema ku Danny dikeniya, hemû rûyê wî, heta hundurê çavên wî jî dikeniyan. Divê boksor weha bin! Qenciya wî, hîsên wî yên dostaniyê ji çavên wî dihatin xwendin. Kesê ku nas nedikir, tunebû. Esprî belav dikir, haqehaqa wî bû û di nav benan de silav dida hevalên xwe.
Temaşevanên ku li dûr rûniştibûn, ji ber heyranbûna xwe, heta deng di wan de hebû, bang dikirin:
- Danny, şêr Danny!
Ev merasîma nîşandana hezkirinê, tam pênc deqîqeyan ajot. Tu kesî Rîvera zilam nedihesiband û eleqê nîşan nedida. Di çavên temaşevanan de, hebûn û tunebûna wî wek hev bû.
Spider Hagerty rûyê xwe yê qermîçokî nêzîkî yê Rîvera kir û got:
- Li min binihere, divê tu ne tirse û divê talîmat ji bîra te neçin. Divê tu îdare bike. Weha zû bi zû mexlûbiyet nabe. Yan na, divê tu zanibe ku me ji bo lêxistina te ya li odeya kincguhertinê, emir sten-
70

diye. Tu fahm dikî? Divê tu di ber xwe de bidî.
Temaşevanan dest bi çepikan kirin. Danny xwe ber bi cîhê ku ew lê rûniştibû hat, xwe daqûl kir, destê Rîvera yê rastê xist nav destên xwe û bi awayekî dostanî guvaşt. Bi devlikeniya xwe di ber bêvila wî de sekinîbû. Temaşevanan ji bo vê reftariya Danny ya wek numûneyeke sportmeniyê dihate dîtin, heta ji wan dihat li çepikan xistin. Danny mîna birayekî, silav li raqîbê xwe dikir. Lêvên Danny liviya û temasevanan ev mîna nîşana şanseke qenc hesibandin û bi

awayekî ji xwe derbasbûyî, ji nû ve li çepikan xistin. Rîvera bi tenê van peyvên ku hêdî hêdî û bi dizî dihatin gotin, dibihîst.
Ji nava lêvên Danny bi bişirandineke ji dil ev peyv hatibû gotin:
- Meksîkiyê piçûk, kûçikê heram! Ez dê te bikujim!
Rîvera tev ne liviya. Ji cîhê xwe jî ranebû. Hew bi çapên tije nefret lê niherî. Wê gavê mirovekî di nav benan de bang kir û got:
- Rabe ser xwe, ker lawê kera!
Temaşevan ji ber vê hereketa ku bi sportmeniyê re li hevdû nake, qeherîn û bi hev re ew protesto kirin. Lê ew tev neliviya û li quncika xwe rûniştî ma. Dema ku Danny ber bi quncika xwe zîvirî, temaşevanan dîsa li çepikan xistin. Gava Danny xwe tazî kir, vin vineke heyraniyê bilind bû. Laşê wî zirav û xurt xuya dikir. rengê çermê wî mîna yê jinan spîboz û şayik bû. Sûretên wî hertim di kovarên sporê de derdiketin. Dema ku Spider Hagerty vezelê Rîvera jê kir, temaşevan xeyal şikestî bûbûn û nerazîbûna wan dihate bihîstin. Ji ber qemerbûna wî, laşê wî zuha xuya dibû. Halbûkî laşê wî bi adaleyan ve hatibû xemilandin, lê ev bi qasî yên raqîbê wî tesîr nekiribûn. Lê ew tiştê ku ji bala temaşevanan nekişandibû, firehbûna sînga wî bû. Ne sertbûna goştê wî, ne jî ew sîstema tenik ya asaban ku mîna torekê xwe li laşê wî gerandibû, bala tu kesî diksand. Ew di çavên temaşevanan de, mîna xortekî hîjdehsalî ku laşê wî dişibiya yê zarokekî piçûk dihate xuyakirin. Ma qey Danny weha bû!
Danny 24 salî bû û laşê wî, laşê zilama bû. Gava ku wan li orta rîngê li tembîhên hakim yên talî guhdar dikirin, ev ferq bêtir xuya di-
7i

bû. Çavên Rîvera ji nişka ve bi Roberts ket. Li paşiya rojnamevanan rûniştîbû. îro ji her wextê serxweştir bû. Ji ber serxweşiya wî, zima-

nê wî jî giran bûbû.
Roberts digot:
- Guh medê Rîvera, vêya ji aqilê xwe dernexe, ew nikare te biku-
je. Ew dê di destpêkê de ji nişka ve û bêplan li te bide, lê divê tu şaş
mebe. Têkeve parastinê û wext derbas bike. Ew nikare zerareke me-
zin bide te. Weha bihesibîne ku tu antremanê dike.
Rîvera tu reaksiyon nîşan neda û ji ber vê jî mirov nizanîbû bê
deng çûyê an na.
Roberts li zilamê kêleka xwe zîvirî û kir pise pis:
- Ax, tu nizanî bê ew çi şeytanekî bêdeng e. Ew hertim weha ye.
Nefreta di çavên Rîverayî de wenda bûbû. Şiklên tivingên bêhej-
mar dibiriqandin. Her rûyê ku di salonê de xuya dibû, bûbû tivin-
gek. Çavên wî ji deverên Meksîkayê yên nêzî sînor û şorqgerên ku
di nava kincên riziyayî de ne pê ve, tu tiştekî din ne didît. Li qunci-
ka xwe dipa. Alîkarên wî rahiştin kursiya ku vedibe û dikeve tev û
di nava benan re derketin derveyî rîngê. Danny li hember wî bû.
Gongê lêxist. Maçê dest pê kir. Temaşevanan bi kêf bang kirin.
Maçeke weha ku baweriya mirov tîne, hîn nehatibû dîtin. Rojna-
meyan rast digotin. Ev maçeke heyfstendinê bû. Danny bi xwe-
çengkirina yekem ve, ji çaran sisiyê wê mesafeya dûr ya ku di nava
wî Rîvera de hebû, girt û xwe avêt ser raqîbê xwe. Ev jî dida nîşan
dan ku bê Danny çawa dixwaze yê Meksîkî bieciqîne. Ne yek, ne
deh, hutukên bêhejmar lêdixistin. Tofana hutukan rabûbû. Rîvera
di nava van hutukên bêhejmar de wenda bûbû. Ew di bin pêlên
hutukên boksorê ku hosteyê karê xwe û ku di her pozîsyonê de hu-
tuk diavêtin de mabû, çûbû. Di bin vê giraniyê de eciqîbû, li benan
diket. Gava hakem wî ber bi orta rîngê ve dianî, ew car din ber bi
benan ve dihat çengkirin. Ev nedişibihiya maçeke boksê. Ev cînayet

bi xwe bû, cenawertî bû. Danny tiştê ku dikare bike, bi awayekî wehsî îspat dikir. Kêf û heyecana temaşevanan gihaştibû bandevê. Ji 72

ber vê jî wan ferq nedikir ku lawikê Meksîkî hîn jî li ser piya mabû. Lêwik xwe li ber derbên Danny yên ku mirov gêj dikir, nikarîbû bigirta û mirov digot qey ew yekcar li ortê nexuya bû. Ev rewş du-sê deqîqeyan weha dom kir. Dema ku ew ji hev veqetiyan, yê Meksîkî hat dîtin. Lêva wî çiriyayî bû û xwîn ji bêvilê dihat. Deverên pişta wî yên ku li benan ketibûn mîna rêyên tije xwîn xuya dikirin. Sînga wî mîna kûrikê ranedibû û danediket û çavên wî jî wek hertim mîna agirê sar diçûrisandin, lê çi feyde, wan ev ferq nedikirin. Wî di antremanan de gelek şampiyonên har dîtibû. Ma hindik caran bûbû hedefa êrîşên wan î bêaman! Ew li hember van derban, ji car bi nîv dollarê û heta di hefteyekê de panzdeh dollaran, fêrî tehamulkirinê bûbû. Wî di wê dibistana bêaman de, xwendineke pirr zor kiribû. Ji nişka ve, tiştekî ku tu kes ne li bendê bû, qewimî. Ew tofana ku mirov gêj dikir, bi carekê rawestiya. Rîvera li ser piya û bi tena serê xwe bû. Danny, ew Dannyê mezin li ser piştê, li erdê hatibû rast kirin. Dema ku hişê wî dihate serê wî, laşê wî kil dibû. Ew ne kil bûbû, ne lingên wî li hev geriyabû, ne jî hêdî hêdî ketibû. Hutuka Rîvera ya rastê wek derba mirinê ji nişka ve lê ketibû û ew li wir rast kiribû. Hakem Rîvera bi paş de daf da, li ser qehramanê ketî sekinî û dest bi jimartina sanîyeyan kir. Ji kê bihata biia bihata, lê temaşevanan ji bo hutukên weha ku mirov dixistin xwarê, li çepikan dixistin. Lê nuha herkes bçdeng mabû. Kes ne li bende tiştekî weha bû. Bûyerê herkes şaş kiribû. Herkesî bi bêdengiyeke asabî, li dengê jimartina sanîyeyan guhdar kirin.

'

Dengê Roberts bêdengiya ku xwe bera ser wê deverê dabû, belav kir:

- Ma min ji we re negotibû ku ew bi herdu hutukên xwe dikare boksê bike?

Di saniyeya pêncan de, Danny xwe bi ser zik ve qeliband û di ya heftan de, li ser çongên xwe sekinî. Di navbera saniyeya nehan û dehan de jî ji bo rabûna ser piyan amade bû. Ger dema saniyeya dehan bihata jimartin jî çongên wî li erdê bimaya, wê gavê ew dê

73

mexlûb bihata hesibandin. Ger heta dehan, çongên wî ji erdê rabû-be, ew li ser lingan rawestiyayî tê qebûlkirin û wê gavê mafê Rîvera hebû ku ji bo wî li erdê rast bike, ji nû ve hutukan lê bixe. Dema ku wî çpngê xwe rakira, Rîvera dê bi ser çavan de vekira. Ji ber vê, ew li dora xwe dizîvirî. Mirov gava bala xwe didayê, didît ku hakim jî bi wî re dizîvire. Dema hakim saniye dijmartin, hêdî hêdî hereket dikir. Rîvera vêya ferq dikir. Hemû biyanî li hember wî bûn, heta hakim bi xwe jî. Hakim, bi jimartina nehan re dehfek da Rîvera. Ev neheqiyek bû. Lê ev neheqî têra ku Danny bi bişirandinekê rabe ser piyan kiribû. Bi milên xwe zik, çav û rûyên xwe girt û xwe li Rî-vera gerand. Li gor qaîdeyên lîstikê, diviyabû hakim wan ji hevdû veqetanda, lê mêrik çavên xwe ji vê re girt. Danny jî mîna mîdyeya ku xwe hişk bi karîna(gemi omurgasi, geminin su içinde kalan bo-lumu) keştiyê ve girtibe, Rîvera zevt kiribû û bernedida. Ji ber vê jî bi qasî ku bi ser xwe de were, zeman peyde kiribû. Ger ew heta da-wiya vê raundê, li ser lingan bisekiniya, wê gavê dê bikarîba di qun-cika xwe de tam deqîqeyekê îstirahat bikira. 0 weha jî bû. Tev dij-

warî û bêhêvîtiya ku li holê bû jî ew dîsa dibişirî.
Temaşevanekî weha bang kir:
- Ew dîsa mîna berê bi kêfxuya dike!
Temaşevanan xwe bi vê tesellî kirin û awayê xwe yê berê domandin.
Gava Danny hat quncika xwe, ji alîkarên xwe re bi hêrs got:
- Hutukê evê Meksîkî mîna xezeba xwedê ye!
Tu ta'ma raunda duyem û sêyem jî tunebû. Danny xwe pêş de diavê, direve, bi wî digre, xwe diparêze û bi vî awayî dixwest gêjbûna ji ber hutuka raunda yekem de ya ku wî tevizandibû, ji ser xwe biavêje. Ya rastî ew bi wê huyukê gêj bûbû, lê ji ber ku di forma xwe de bû, dîsa bi ser hişê xwe de hatibû. Lê wî êdî nema dikarîbû wê taktîka xwe ya wehşî bi kar bianiya. Wî êdî dizanîbû bê evê Meksîkî çi xurt û jêhatî ye. Wî nuha hemû şiyan û zanebûna xwe ya di warê boksê de bi kar dianî. Di hemû lîstikên xwe de hoste bû.
74

Tu hutukê xurt nikarîbû biavêta, lê dîsa jî wî bi saya teknîka xwe, raqîbê xwe gêj dikir û dibetiland. Gava Rîvera hutukek diavêtê, wî sê hutuk diavêtê, lê ev ne hutukin bi tesîr bûn. Tesîra hutukên wî ne ji ber xurtbûna wan, lê ji ber pirrbûna hejmara wan dihat. Wî hurmeta vî zarokê ku herdu hutukên xwe bi hostetiyeke mezin bi kar dianî, digirt. Rîvera di parastinê de, dest bikaranîna hutuka xwe ya çepê kir. Gava xwe li hember êrîşan diparast, hutukên wî yên çepê li ser hev li dev û bêvila Danny diketin. Lê Danny dikarîbû di gelek stîlan de şer bikira û ya rastî jî ji ber vê ji bo şampiyontiyê mîna namzet dihat destnîşan kirin. Di boksê de dikarîbû bi rehetî ji stîlekê derbasî ya din bûbûya. Wî nuha jî dest bi stîla ji hundur ki-

ribû. Ew di vê stîlê de gelek bi serkevtî bû. Bi awayî hutukên ku ji aliyê çepê dihatin jî diparast. Gava ku wî hutuka xwe ji binî de ber bi jor ve avêt û yê Meksîkî li erdê xist, temaşevanan wextî govend bigirtana. Rîvera xwe da ser çongeke xwe û li bende hejmartina saniyeyan ma. Wî ferq kir ku bê hakim çawa bi lez dihejmêre.
Danny di raunda heftan de, ew aparkuta xwe ya meşhûr dîsa lê xist. Rîvera bi tenê hebekî kil bû, lê di wê esnayê de Danny ew bi derbekê di nav benan re avêt derve. Rîvera bi ser serê xwe ve ket ser rojnamevanan. Mêrikan jê re bûn alîkar û ew hilkişandin heta ber benan. Dema hakim dihejmart, wî jî xwe dabû ser çongeke xwe û îstirahat dikir. Ji bo ketina rîngê, divê ew di nav benan re derbas bûbûya. Danny jî ji xwedê ev dixwest. Hakim xwe tev lê nedikir, tew ji bo paşdevekşandinê Danny îkaz jî nedikir.
Hişê temaşevanan ji serê wan çûbû û heta ji wan dihat bang dikirin:
- Wî bikuje, Danny! Danny, wî bikuje!
Tiştê ku ji destê Danny dihat, texsîr nedikir, lê Rîvera ne di saniyeya nehan de, di ya heyştan de ji nişka ve xwe di nav benan re rakir û ket rîngê. Danny û ew hatin hember hevdû. Wê gavê hakim ket orta wan û mîna hakimekî alîgir, hemû rehetiyên ku ji bo Danny diviyabû peyde kir û Rîvera bi paş de kişand. Halbûkî gava
75

cîh li Danny teng bûbû, raqîbê xwe zevt kiribû û bernedabû, wê gavê hakim wan ji hev jî nekiribû. Rîvera heta dawiya vê raundê îdare kir. Pişt re hişê wî hat serê wî û ber çavên wî ronî bû. Hemû wek hevdû bûn; hemû, biyaniyên ku bi nefretê dagirtî bûn. Di warê neheqiyê de tu ferq di navbera wan de tunebû. Di vê dema mirin

û mayinê de, hinek tişt dihatin ber çavên wî: Rêhesina ku di nava çolê re derbas dibû, polîsên Meksîkî û Amerîkî, girtîgeh û gelê ku di nav kincên qetiyayî de... Manzarayên jiyana piştî greva "Rio Blanco"yê ya ku nefreta mirov zêdetir dike û dilê mirov dişewitî-ne... Dû re wî dît ku bê bahoza şoreşa sor ya biheysiyet çawa van manzaranan ji welatên wî paqij dike. Sîleh li hember wî bûn. Her rûyekî ku wî jê nefret dikir, sîlehek bû. Wî ji bo xatirê sîlehan şer dikir. Ew bi sîlehan re bûbû yek. Ew şoreş bi xwe bû. Wî ji bo he-mû Meksîkayê şer dikir. Temaşevan ji Rîvera hêrs bûbûn. Ji bo çi wî ew lêdana ku heq kiribû, nedixwar? Wî wek navê xwe dizanîbû ku ew ê vê maçê wenda bike! Ji bo çi weha li ber xwe dida? Tema-şevanên ku meyila wan li ser Rîvera bûn, gelekî hindik bûn. Ew jî wan temaşevanên ku pişta xwe bi şensa xwe ya şerdîstinê ve girêda-bûn, bûn. Wan teva baş bawer dikirin ku Dartny dê bi serkeve, lê dîsa jî li ser yê Meksîkî bi awayê li hember yekê sisê û li hember ça-ran jî deh, pere razandibûn. Hetta yên ku li ser bê Rîvera dê di ra-unda çendan de naqawt bibe, bi şert lîstibûn jî hebûn. Pereyên ku li dora rîngê diçû û dihat, nedihat hesibandin. Yên ku digotin, Rîvera dê nikaribe heta raunda heftan îdare bike, hebûn. Ew kesên ku ji sertlîstinê bi qezenc derdiketin, nuha jî pişta xwe didan kursiyên xwe û bi heyecan beşdarî nava wan kesên ku ji bo Danny diqîriyan. Rîvera destûra mexlûbiyetê nedida. Raqîbê wî di raunda heyştan de, ji bo aparkutekê lê bide, belasebeb li valabûnekê geriya. Rîvera di raunda nehan de, weha kir ku devê temaşevanan dîsa ji hev ve-bû. Di dema ku ew nêzîkî hevdû bûbûn de, Rîvera ji nişka ve xwe jê xelas kir û di wê mesafeya ku bi qasî bihustekê de, hutuka xwe ji jêr ber bi jor ve avêtê. Danny got "gurrm" û ket erdê. Li bende hej-

martina saniyeyan ma. Devê temaşevanan bihustekê vekirî mabû. Danny bi sîleha xwe derb xwaribû. Ew aparkuta wî ya rastê ya mî-. na destanekê di devê xelkê de, nuha li hember wî hatibû bikaranîn. Gava ku neh hat hejmartin û Danny rabû ser xwe, Rîvera ber bi wî çû, lû hakim ket orta wan û nehişt tu hutuka lê bide. Halbûkî gava ji berdêla Danny Rîvera diket erdê, hakim rêya Danny qet nedibir-rî. Rîvera di raunda dehan de, du carên din jî erd bi raqîbê xwe da maçîkirin. Danny dîn bûbû. Lê bêî ku dev ji bişirandina xwe berde, dîsa dest êrîşên xwe yên wehşî yên ku di destpêka maçê de kiribû, kir. Lê her çi dibû, bila bûbûya, wî tev li wan hutukên ku li ser hev dihat avêtin jî nikarîbû Rîvera kil bikira. Halbukî Rîvera di nava vê bahozê de tam sê caran erd pê dabû maçîkirin. Danny êdî nema di-karîbû bi ser xwe ve bihata. Di raunda yanzdehan de, bi temamî perîşan bûbû, heta raunda çardehan jî hemû şiyana xwe ya di vî meslekî de peyde bûbû, bi kar anîbû; ber bi pêş ve diçe, paş ve vedi-kişe, dest bi parastinê dike û şer dike û direve û bi vî awayî dixwaze quweta xwe paş de bîne. Ji aliyê din ve jî bi metodên fenek yên boksorekî bi tecrube, bi faul şer dikir. Wî hemû fenê ku dizanîbû, bi kar anî; mîna xwe tesaduf e, Rîvera zevt dikir, lepikên wî dixist bin çengên xwe û bernedida û ji bo bîhna Rîvera biçikîne, lepikên xwe dida ser devê wî. Dema ku xwe li Rîvera digerand, di guhê wî de sixêfê nemayî dikir. Herkes, lê bi rastî herkes, hem hakim û hem jî temaşevanan hêla Danny digirtin, herkesî ji bo kuew qezenc bi-ke, xwe perçe dikirin. Wan dizanîbû bê Danny li çi difikirî; ew li benda wê dema ku dê bi hemû taqata xwe hutukek li Rîvera xista, bû.Danny vekirî şer dikir, paş ve vedikişiya, wî teşwîqî ser xwe dikir û li firseta ku wî ji xafil de bigre û lê bide digeriya. Wê gavê wî dê

heta quwet tê de heba hutukek lê bidaya û maç biqedanda. Piştî vê hutukê gelek rehet bû, wî dê mîna her boksorê mezin, berê bi hutuka xwe ya rastê li zikê wî xista, dû re çenga wî û diqediya diçû... Heta ku ew li ser piya bimîne, dikare vê bike, ji ber ku wî bi quweta milên xwe ve nav dabû. Di navbera raundan de, alîkarên Rîvera
77

qet alîkariya wî nedikirin. Ew peşkîrên ku wan li ber wî kil dikirin, ew qet hênik nedilcirin. Spider Hagerty xwedêgiravî aqil dida wî, lê Rîvera wek navê xwe dizanîbû ku ev taktîk şaş in. Herkes li dij wî bûn. Wî di raunda çardehan de Danny dîsa li erdê rast kir. Hakim dest bi hejmara saniyeyan kiribû û Rîvera jî paş ve vekîşîyabû û milên xwe bera ber xwe dabû û îstirahat dikir. Pis pisên li qoziya wî alî ji çavçn wî nedireviyan. Wî dît ku Michael Kelly çû ba Roberts û di guhê wî de kir pis pis. Rîvera li çolê mezin bûbû û guhê wî bi qasî yê pisîkekê hesas bû. Ji ber vê yekê jî wî hinek ji axaftina wan bihîstibû. Wî dixwest hemû axaftinên wan bibihîse, ji ber vê jî dema raqîbî wî rabû ser piyan, wî heta ber benan ajot.
Michael digot:
Biçe bawî!
Roberts di maneya erê de serê xwe kil dikir.
- Jê re bibêje ku çi dibe bila bibe, lê divê Danny vê maçê qezenc bike. Min hebû malê xwe xistiye ortê. Ger ev mesele di raunda panzdehan de neqede, ez mahf dibim. Ev lawik li peyva te guhdarî dike. Biçe ba wî û jê re tiştekî bibêje.
Wê gavê Rîvera fahm kir ku ev mesele pirr ciddî ye û herkes ji bo têkçûna wî dixebke. Wî Danny careke din li erdê rast kir. Milên xwe bera ber xwe da û li bende rabûna wî ma.

Tam di wê esnayê de Roberts bang kir:
Biçe quncika xwe! Edî heta dehan, nema ji cîhê xwe radibe.
Ew mîna ku di antremanan de emir dide, dipeyivî. Lê Rîvera bi çavên tijenefret lênihêrî û dû re xwe da benda rabûna Danny. Piştî - raundê, dema ku Rîvera çû quncika xwe, Kelly xwe gîhand ba wî û jê re got:
Kuro kero, êdî bes e, xwe mexlûb bike! Rîvera divê tu mexlûb bibî. Ger tu bi ya min bikî, ez ê te di nava pereyan de dakim. Ez ê careke din bihêlim ku tu zora Danny bibî. Lê ka nuha were bi ya min bike û êdî xwe mexlûb bike!
Ji çavên Rîvera dixuyabû ku wî ev gotin bihîstibû, lê tu îşaretên
78

ku qebûl dike an nake, nedabû.
Kelly bi hêrs jê pirsî:
- Tu ji bo çi tiştekî nabêjî?
Spider xwe avêt ortê û got:
- Tu qûna xwe biqetîne jî dê zora te biçe. Tu çi dike, bike, lê ha-kim di dawiyê de weha bike ku tu dê mexlûb bibe. Ger tu guhê xwe bide Kelly, wê ji bo te baş be.
Kelly li ber wî geriya:
- Ez qurbana te bim, tê xwe mexlûb bike! Ji bo ku tu bibî şampi-yon, çi ji destên bê, ez ê bikim.
Tu peyv ji Rîvera çênebû, lê bi tenê weha got:
- Soza min soz e. Ger min got, ez ê bikim, ez dikim.
Dengê gongê hat. Rîvera bîhna talûkeyekê stendibû. Temaşevan bi lîstika ku dihat gerandin, neesiyabûn.Rîvera pê nizanîbû bê talû-keyeke çawa ye, lê wî nuha talûkeyek di rîngê de, li ber bêvila xwe

hîs dikir. Weha xuyabû ku baweriya Danny ya di destpêka maçê de bi şûn de hatibû. Cesareta wî ya ku xwe bi pêş de diavêt, Rîvera xiste nava endîşeeykê. Dolabin dizîvirîn. Danny êrîşî Rîvera kir, lê Rîvera xwe jê xelas kir û xwe da kêlekê. Xuya bû ku raqîbê wî dixwest xwe nêzîkî bike û şer bike. Ji bo hîleya ku dihat fikirandin, qey pêwîstî bi rewşeke weha hebû. Rîvera xwe paş de vekîşand û Ji rîngê çû û hat. Lê wî dizanîbû ku çi bikira bila bikira, di dawiyê de wê muheqeq bihatana nêzîkî hevdû û ew hîle dê bihata kirin. Gava Danny êrîşî wî kir, wî weha da xuya kirin ku sînga wan dike bigihêje hevdû, lê tam di dema ku sînga wan hat hember hev, Rîvera ji nişka ve paş de vekişiya. Di wê demê de, ji quncika Danny dengê "faul"ê hat. Hakim nema dizanîbû bê wê çawa bikira. Biryara ku diviyabû bida, di nava lêvên wî yên ku diricifîn de ma.
Wê gavê lawikekî ji balkonê bang kir:
- Faula ecemiyan!
Bi ser vê de, Danny berê xwe da Rîvera û dest bi sixêfên pirr pîs kir. Rîvera êdî biryara xwe dabû ku ew ê nema ji nêzîk ve şer bike.
79

Bi vî awayî şensa xwe dadixist nêvî, lê wî ev jî pirr baş dizanîbû ku serkevtin bi wê hutuka ku dê meselê bi temamî tayin bike ve girêdayî bû. Wan dê ew di firseta yekem de, ji ber sûcê li dij qaîdeyan dîskvalîfîye bikirana û ev mesele hiqedandana. Danny êdî bê hesab êrîş dikir. Wî di du raundan de bera dû Meksîkîyê ku nedihişt ew xwe nêzîkî wî bike, da. Rîvera hutuk li ser hutukan xwar. Ji bo ku xwe nexe talûkeyê, li hember hemû derban îdare kir. Ev rewşa talî, hişê temaşevanên ku piştgiriya Danny digirtin ji serê wan biribû; di cîhê xwe de nedisekinîn. Wan tu ma'ne nedidan vê rewşê. Bolcsorê

ku taca serê wan bû, tu nemabû ku maçê bi serkevtinê biqedîne. Bi nefret bi ser Rîvera de diqîriyan:
- Tu ji bo çi şer nakî û direvî? Tirsonekê heram! Tu jî lê bide, kûçik! Li wî bide Danny, wî bikuje!
Di wê salona mezin de, yê ku neketibû heyecanê, Rîvera bi tenê bû. Tiştê xerîb ev bû ku ew mirovekî ji van kesên ku li vê derê ne bêtir dikeliya û ya din jî ew ji bûbû şahidê heyecanên ku ji hêrsa kollektîv ya vî deh hezarê li vê derê mezintir. Ji ber wê, ev heyecan û germî, mîna hênikayiyeke êvareke havînî bû. Danny heta raunda hivdehan jî bi qurbanê xwe lîst. Carekê Rîvera bi tesîra hutukekê kil bû û dema ku dikira li ser piştê biketa, miJên xwe bera ber xwe da. Danny got qey firseta ku ew lê digeriya, bi dest wî ket. Êdî yê Meksîkî û wîcdanê Danny. Lê Rîvera bi vê numarayê ew xapand û ji nişka ve hutukek li orta devê Danny xist. Lingên Danny ji erdê qut bû. Gava ku rabû ser piyan, hutukeke necêb li çeng û stuyê wî ket. Rîvera ev lêdan sê caran li ser hev tekrar kir. Her çi dibe, bila bibe, lê ne mumkun bû ku mirov bigota, ev hutukanan li dijî qa-îdeyan e.
Kelly li hakim nihêrî û awakî bêçare naliya:
-Ax,Bill!Bill!
Hakim bi xemgînî bersiv da:
- Ez çi bikim, ew tu firsetê nade min.
Danny hewil dida ku rabe ser piyan. Menajerê wî nedixwest peş-
80

kîrê biavêje rîngê, lê Kelly û yên ku li kêlekê rûniştibûn, ji bo ra-westandina maçê bang polîsan kirin. Rîvera dît ku komîserê zikme-zin di nav benan re derbasî rîngê bû. Tu ma'ne neda vêya, got qey

ev jî xayintiyek ji wan xayintiyên van biyaniyan bû. Danny li hember wî li ser piyan kil dibû. Tam gava ku hakim û komîser ji bo ji hevdûveqetandinê xwe bi hevdû re dirêjî Rîvera kirin, Rîvera jî derba talî li Danny xist. Êdî ne hewce bû ku mirov maç rawestanda. Danny li wê erdê weha rastkirî mabû.
Rîvera bi dengekî sar ji hakim re got:
- Bihejmêre!
Dema hejmartin qediya, alîkarên Danny ew hilgirtin û birin quncika wî.
Rîvera bi awakî ji xwe bawer, pirsî:
- Kê zora kê bir?
Hakim bê dilê xwe, bi destê wî girtû bilind kir. Tu kesî Rîvera pîroz nedikir. Dema ku ew ber bi quncika xwe ve çû, tu kesî neda pê wî. Alîkarên wî kursiya wî jî dananîbûn. Pişta xwe da benan û bi nefret li alîkarên xwe û li qelebalixa ku ji deh hezar biyaniyan pêk dihat, nihêrî. Taqat di çongên wî de nemabûn, ji ber betilbûnê digiriya. Gava ku ma'dê wî dixeliya(dilê wî li hev diket), sûretên dijminan di ber çavên wî re diçûn û dihatin. Dûre hat bîra wî ku ev tiving in. Tiving êdî yên wî bûn. Şoreş dikarîbû dest pê bikira.
81

WEŞANÊN NUDEMÊ
Celadet Bedir-Xan / Gramer
BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ
Egîdê Xudo /Roman
DÊ Û DÊMARÎ
Nûredîn Zaza / Çîrok
KESKESOR

Rohat/Lêkolîn
Dl FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN
Mehmed Uzun / Essay (Ceribandin)
HEZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ
Medenî Ferho / Roman
MÎRZA MEHEME
Rojen Barnas / Ṣiîr
MILKÊ EV1NÊ
Jack London Werger: Mustafa Aydogan /
Çîrok
ZAROKA ṢEVE
Albert Camus Werger: Fawaz Hesên / Roman
BIYANÎ
de Saint-Exuperi Werger:
F. Husên /Çîrok
A.
MÎRZAYÊ BIÇÛK
Duhokî
ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR Amadekar: X.
ŞerefaanCizîrî/Essay (Ceribandin)
RAMAN Û KULTUR
Cengîz Aytmatov Werger: Nacî Kutlay / Roman
ÇÎROKA SOFÊR
Dostoyevskî Werger: Firat Cewerî/ Roman
SEVÊN SPÎ
John Steinbeck Werger: Firat Cewerî/Roman
MIṢK Û MIROV
Çexov Werger: Rrat Cewerî / Piyes

BEXÇEYÊ VÎŞNE
Samuel Beckett Werger: Firat Cewerî/Piyes
BENDA GODOT
Ll
Rrat Cewerî / Aforisma
GOTINÊN NAVDARAN Amadekar:
Rrat Cewerî /
Çîrok
GIRTÎ
Rrat Cewerî /
KEVOKA SPÎ
Çîrok

Jack London di sala i876'an de
San Fransiscoyê
li
hatiye dinyayê. Zaroktiya wî di nava feqîrtiyê de, lê bi
xebat û berxwedanê ve tijî derbas bûye. Ew cara pêşî di
saliya xwe de çîrokeke xwe bclav dike û ew çîrok jî
17
wî dikişîne cîhana nivîskariyê. Jê pê ve London bê
westan dinivîsîne. Ew di temenekî çil salane de nêzîkî
pirtûkî dinivîsîne. Hinek ji pirtûkên wî yên naskirî
50
ev in: "Pahniya Hesinr'1907, "Martin Eden" 1909,
"Qêrîna Wahşetê" 1903, "Berî Adem" 1906, Şampiyon,
Geliyê Heyvê, Berxwedan, Kûçikê Sîrkê û hwd.
Weşanxaneya me vê pirtûka ku berê du çîrokên wê

"Xwêdana Eniyê" û "Yê Meksîkî" di kovara NÛDEMê
de hadbûn weşandin, bi serbilindî pêşkêşî xwendevanên
kurd dike.

ZEVIYÊN SORO

weşan no: 4 Reza edebiyate no: 3
Publishing House of Kurdistan
Editör: Hanefi Celepli
© Nûrî Şemdîn
Printed in Svveden
by APEC Tryck & Förlag
Stockholm 1988
ISBN 91 -87096- 03 -X
Nûrî Şemdîn
Zeviyen Soro
roman
Weşanxana Kurdistan
Stockholm 1988
Peşgotin
Ez tucara nefýkirîm ku eze rojeke romaneke binivîsim. Le bele min
ji xwendina roman, çîrok û tişten dîrokî hez dikir û di xortaniya xwede,
mînanî gelek xortan, min jî çend helbest nivîsîn.
Min demeke jî, miqale û nivîsen polîtîk ceriband. Le bi awakîamatorî
bûn. Tucara doza nivîskariye nehate bîra min, ez ji ve yeke pir dûrim.
Le bele, jiyan devvlemende, pir tiştan tîne peşiya merivan. Dema ku
em gelek kurd di girtîgeha Diyarbekrede bûn, di navbera îdara girtîgehe
û girtiyande gelek caran bûyeren ne xweş pek dihatin. îdara zin
dana li girtiyan zorbetî dikir, em jî li dij derdiketin. Carna jî girtiyen

ciwan, "civvantî" dikirin, bûyeren nece dibûn. Careke, di bûyereke wehade,
hemû pirtûk û kovaren me ji dest me girtin û hemû tişte çapemenîji mere qedexe kirin. Tene name me dikarîbû binivîsanda. Min jî herroj, bi mebesta nivîsîna naman kaxez kirîn û destbi nivîsîna ve romane kir. Ev romana di deste wede, min di heşt mehada nivîsî. Zimane romane bi tirkî bû, min çiqas xîret dikir jî, zimane min kevn bû, ez careke wisa hîn bûbûm. Ez dizivirîm, min careke din roman dixwend û zimane xwe nû dikir.
Piştî ku em ji hepse derketin, du weşanxaneyen ku min nasdikirin, xwestin romana min, "Zeviyen Soro" bi nave "Soro'nun Topraklari" çap bikin. Le bele, rengen grûptiye li ser wan dostan hebûn, min nedix-wast ku rengekî grûptiye li ser min hebe. Lewrajî romana min çapnebûyî ma.
Piştî ku cunta leşkerîdi 12-e îlona 1980-îde dest danîser îdara dewlete, ez mecbur bûm ku ji welet derkevim, min ew romana jî derxist.
Ji bo ku piraniya kürden Tirkiyaye rehet bixwînin, min dixwast ku ro mana xwe bi zimane tirkî çap bikim. Le bele hevale min Hanefî Celeplî bala min kişand ku ve romane bi kurdî çap bikim. Hanefî bi kurtî digot: "Gerek herkes li gora taqeta xwe hewl bide ku çand û zima ne gele xwe peşde bibe. Di destpekede dibe ku tişten gelekî giranbiha ji deste merivan neye, le paşe hedî hedî ev kemasî ji hole radibin. Deyne hustuye her revvşenbîre kurd eve ku xizmeta çand û zimane xwe bikin."
Ez niha li peş we, sipasiyen xwe peşkeşî Hanefî dikim ku ev tişte girîng anî bîra min û min jî di salekîde, di nava karen xwe yen dinede ev romana ji nüve bi kurdî nivîsand.

Ji bo ku zimane kurdî li Kurdistana Bakur zede nehatiye karanîne, dema ku min destbi nivîsandine kir, min dît ku ev kara çiqasî zehmete. Le herweha ez pe hesiyam ku zimane kurdî çiqasî dewlemende. Li vvelate me, li her hereme zaravake bi kar tînin. Ev yeka dewlemendiya zimane kurdî nîşan dide.
Min "Zeviyen Soro" bi zarave Serhede dinivîsî, hevalekî ku kurdî rind dizane, rojeke rûpelek ji romane xwend û bi nîvhenekî göte min: "Keke, kî ku romana te bigre, gerek tu biçî mala wan û romana xwe ji wanre bixwînî." Le dîsa jî min kare xwe berdewam kir.
Çawa min li jore diyar kir, ez doza nivîskariye nakim û kemasiyen min gelekin, le ez ji xwendevanan hevîdarim ku van kemasiyen min bejin û binivîsin. Eðer mecala min cebe, eze "Zeviyen Soro" bi tirkî bi nave "Soro'nun Topraklan" çap bikim.
Ji çûyîna romane jî te xuyane ku sere "Zeviyen Soro" berdewame, ketiye rewşeke nû. Ez dixwazim we revvşe jî binivîsim, le di nava ka ren rojînde wisa ne hesane.
Nûrî Şemdîn
-IÛsiv
axa ji küre xweye biçûkre got:
Kuro, here Şükriye nobedar bibîne, bira zû be vira.
Ûsiv axa, te digot bare hemû dine li ser wiye. Bi pirçî, çav û rûyen wî tevlîhev bûbûn. Çaven wî çilmisîbûn. Cima wilo bû? Heta niha qet weha nebû bû. Wîbenz avetibû, se çar roj çûbûn he wî rûye xwe kur nekiribû. Nesitirî û di rewşek dinde bû.
Tegehiştibû, ku ew çend mehin di rewşa wîde guhartineke mezin hebû. Ji hale xwe, bi xwe jî ne razîbû. Wîji zeviyen xwe ku dabû gundiyan, para xwe distand. Ev kara jî tiştekî tevlîhev bû. Ewî hemû dek û dolab bi kar anîbûn û gund gişt xistibû deste xwe. Dîsa jî ji hale xwe

ne razîbû. Her çiqas di van salen dawîde sere wîbi gundiyanre neeşiyabe jî... Para ku dikete deste Ûsiv axa ne ewqas zede bû. Axayen hawîrdor niha erde xwe bi traktoran dajotin. Gundî jîji erde xwe derdixistin.
Le bele we çawa bikira? We çawa bera gundiyen xwe bida? Ewqas şalin rojen şenî û şînayî bi hevre derbaskiribûn. Cima? Ma heqe wî tunebû?
Ger ûsabe, cima gund bi hezar derd û kulan xistibû deste xwe?
Heq£ wîjî hebû, wekî bera gundiya bide.
Birûyen xwe dişkandin. Gerek erde xwe ji van meriven bexîret bistîne. Axayen deste çend sala bere ev kara kiribûn. Ma Ûsiv axa we ci ma nekira?
Ji nişkava dihate bîra wî: "Le gundî dernekevin, eze çi bikim?". Te digot wekî agirek dikete hundire wî. "Eðer dernekevin, li peşxelqe rezîlbûn
ne beşe, gundî edî gura min jî nakin. Mirov careke neşemite, edî kes nikare bi wanre serederiye bike. Na, na. Hukumat, cendirme benda çi rojene? Ev tiştekî nebûyiye. Min heta niha erde xwe bi şîrikî dida, îrojî nadim. Çi ji kere!"
Le dîsa jînerehet bû. Ûsa difýkrî, le bi xwe jîne bawer bû. Nedikete sere wî, wekî gundî ûsa bi rehetîji erde wî derkevin. Ev nerehetiya di Ýaşe xwede dihesiya. Dile wî dieşiya. Ûsa dieşiya, ku ji ber eşe erîşî doraliya xwe dikir.
Jina wî Seyrane bi hale wî dihesiya, le zede li ser nedisekinî, betir bi kare xwe mijûlbû. Küre wiyî biçûk, şewqe dibistane li serî, solen kevn di lingde, di şale reşde li hundir bi şive xwe dilîst. Bi lez ji derî derket, terişî û bi herdu lepanve kete erde. Rabû ser xwe, töze li ser xwe daw- şand û ji ber çavan winda bû.
Qasekîşûnde nobedar hat. Şükriye nobedar, yekî sermezin, şewqe

li serî di renge qehwe, peşiya şewqe direj bû. Te digot şewqe li jora sere wî dimine. Li peşiye, nişana hesinî ya nobedariye hebû. Şukrî, ji bo v£ şewqe û kincen nobedariye berî du sala pec şeş cara çûbû bajer. Bi zehmetiyeke mezin bi dest xistibû. We çaxe kefa wî gelekî pera hatibû. Niha ceket û şewqe tene mabûn. Şale wî çend meha jî damîş nedabû.
Şukrî sîh salî bû, le bele çil salî nişan dida. Qet vala nedibû, ku li kare xwe binere. Di mala Ûsiv axade, hertim olamtiya wan dikir. Ji ber ve yeke jî, kare mala wan li ser stuye jina wiye belengaz dima. Belengaze tene hestî û çerm mabû. Şukrî û jina wîji deste vî nobedariye zare zar bûn. Le xema ke bû? Axa hercar, "eze çawa yekîji vî baştir bibînim" digot û pirçiye xwe dikir. Edî Şukrî jî hînî ve revvşe bûbû. Li gund çi dibû çi nedibû, ciyen ku axa le beşdar nedibû gundiyan çi di got, Şukrî ev tiştana ji axere carna qal dikir. Le ne hemû tişt.
Were Şukrî, hele were!
Şükriye nobedar bi edeb li peşberî axe sekinî. Axe li hemberî xwe cî mşanî wî da, cixarek vexist, yek jî avete Şukrî. Şukrî cixara axe xiste berîka xwe, ku paşe bilcşîne:
Axaye min xweşbe, xwede ji te razîbe.
Ji cîranen ku ne li gundin, kî hene?
Şukrî hinekî sekinî, deste xwe bire eniya xwe, li erde niherî: te di got li tiştekî diðere.
Hemîde Bekir û küre Feqîve sibe çûne bajer, ser toxtir. Kesîdin nizanim. Ewjî, bawer dikim we îşev vegerin.
Başe.
Nobedar ji pirçiye rûye axe tiştek dernexist.
Here malen hemû gundiyan. Bira zilam hemû bene vira. Ewjinen ku meren wan, küren wane mezin tunene, kîne?

Fadileya pîre. Kare we bûraye we dike. Bira ew jîbe?
Na, na. Bûraye we Misto bira be.
Kî din maye?
Fate maye, axa.
Ere, ere. Fata bi bela ma. Jere beje, bira ewjî be. "Te cima ban min nekir?" we bike mirte mirt. De Şukrî, here bangke. Wexta ku ro çû ava, bira ben. Çend giliyan eze ji wanre bejim.
-IIMale
wan, male wan,
Bû bela sere wan.
Cigerxwîn
Şükriye nobedar di destde şivek, xwe ji kûçiken gund diparast û gazî ye hundir dikir.
Ho Evdo, Evdooo!
Evdo derkete derva.
Işev axa gazî dike. Çend gotinen wî hene ji gundiyanre.
Çine gotinen wî, Şukrî?
Ez jî mîna teme, bawerke nizanim.
Şukrî bere xwe da xanikîdine. Evdo şa nebû. Ewî dizanî ku di bangkirinen wisade, yan ji bo tiştekî pere dihate berhevkirine, yan axa karekî dixwaze, yan jî we ji bo erde xwe tiştekî beje.
Xale Miho, xale Miho!
Ho Şukrî, xwarzî, were hundir.
Ûsiv axa we tiştekî ji gundiyanre beje. Dixwaze biýa hemû bene mala wî îşev.
Kesekji bajer hatiye? Çiye Şukrî, tiştek heye? Haya te dibe xwarzî.
Na xale Mihe, kes nehatiye. Ji bo çiye, ez jî nizanim, got û çû.
Çawa xale Mihe kete hundir, ji jina xwere got:

Ev axa jî edî li rûye me nanere. Derde wiyî mezin eve ku ji me hinekî zede pere bistîne. Kare zede bi me bide kirine. Dîsa deka û do laba difýkire. Le nizanim çiye?
Nobedar yek û yek çû cem hemû gundiyan. Yen ku ne li mal bûn, xeber ji jinen wanre an jîji zaren wane mezinre dihişt.
Olo Soro, biraye Soro!
Soro dora sîh salî xuya dikir, pore wî sor û çûr bû. Enî fýreh, dagirtî û ciwan bû. Mirov bawer nedikir ku ji van deraye. Te digot qey ji cikî dine hatiye vira. Bi rûkenî nobedar keremî hundir kir. Le kare Şuk rî he xilas nebûbû, lewra ew nekete hundir.
Axa bane hemû gundiyan dike. Ewe hin tiştan ji were beje.
Li eniya Soro qirçimokeka kûr çebû. Çaven wî li rûye Şukrî li tiştna geriya, le nedî... Xwe jî ne merivekî wisa bû ku zede xeberde.
Bele bira, ser sere min, got û deste xwe da ser mile Şukrî:
Axe te, helka ve çare ji gundiyanre singekî çawa hazir kiriye?
Nerme an hişke? got û keniya.
Soro ez çi bejim? Min jî tiştek fem nekir. Ez nikarim mînanî te bejim, ye min kare, destura xwe xwest û çû.
Piştî gelek malan, Şukrî hatibû ber mala Fate. Mala Fate li aliye di ne gund bû. Fate bi mere xweve ji dûre, ji serhede haline vira. Ji Wane an jî ji Qerekose, kes rind nizane. Le dibejin ku ew ji serhedene.
Jin û mer bi çend firaqanVe hatine vira. Axe alîkarî kiriye, gunehe wî bi wan hatiye û piçek erd û cotek ga daye serhediyan. Ewjî xebitîne û deyne xwe dane. Le gelek sal borîne, nikarîne ji bin deyne axe derkevin. Mere Fate yekî direj û jîr bû. Bi namus bû. Hinekî bedeng bû, di nava malede pirsa Fate derbas dibû. Ewî dizanî wekî Fate ji çi hez di ke û ji çi aciz dibe. Lewra jî, wexta ku axe ew şandibû karekî dizî û xirab, ji Fate veşartibû; jere qal nekiribû. Çend rojan şûnde xeber hat

ku mere Fate li çiye hatiye kuştin. Axa hat mala Fate û dostanî nişan da, cinaze mere we hilda. Çend cara hale Fate pirsî. Le dîsa jî gava Fate axe dibîne, hişe we ji sere we diçe û gej dibe. Bîna we diçike. Le wilo... Li ve xeribiye! Du zaroken penc şeş salî sewî hiştin û çûyîn ji bo ke bû? Fate qet ji axe hez nedikir. Ûsiv axa jî zanibû. Lewra edî nedipirsî.

Fate mîna mera bû. Şoren xwe ji bave xwe jî nediparast. Yeka mîna we, neheqiye, nepakiye li rûye mirov beje, nehatibû dine... Derheqa axan û began gotinen ûsa digotin ku meriv metal û şaş dima... Ke dest avetiye namusa gundiyen xwe, kîjan axe feqîr û fiqare perçiqandiye, ke hukumatere alîkarî kiriye û kurape xwc, axaye gundekî din kuştiye, ji Fate bipirse ku bi cî û cî, bi nav û nav ji tere beje. Yen ku dest avetine namusa xulame xwe... Bira beje û beje.

Fate kare xwe bi xwe dikir. Zaren we he nikarîbûn kar bikin. Lawikan derd û kule diya xwe fem dikirin. Gelekî jî bi fem û bi aqil bun. Hinek kare giran bi pera dida kirine. Yen ku cwqas derde wan hebin,

10

we çilo bin? Por nivî nivî gewr, dest tişî tişî, le bi can û bedenave sax bû. Rû û surete we li ber sur û tave şevvitîbûn. Hine ciye rûye we qelişîbûn.

Kince we kevn, bi pîne, le bele paqij bûn. Jinen gund, "ev Fata di nava ewqas şuxulîde çilo wisa paqij dimîne" digotin, ýrietel diman.

Xwenga Fate, hela sere xwe ji male derxe, xwenga Fate!

Hatim, hatim.

Xwişke, zehmetke, gundî we îşev li mala axe bin. Hin gotinen axe hene.

Şukrî, xwîşka te qurban. Ewqas cîran tene, eze jî lewik hildim û bem.

III

Min digot, axa û beg; wego, kýýre min gýýh mede,
Ew şivanin, sermiyanin, dane gur wan col û pez.
Cigerxwîn.

Evar hat. Gundî gişt kare xwe zûtire xilas kiribûn. Hinek dil bi tirs, hinek bi meraq riya mala axe girtin. Yen ku hatibûn, di nav xwede xeber didan, dipirsîn: "gelo çiye?" Hinek ji wan sere xwe xwar dikirin. Çendeken wan bedeng bûn. Yek dudu jî bemînet bûn. "Çi dibe, bila bibe" digot çaven wan. Oda axe, hewşa wî hedî hedî tijî dibû. Li bin roniya loksa dardakirî rûniştibûn. Denge lokse li her alî dihate bihîstîne. Hemû nezîkî hev rûdiniştin. Li herî jore ciye axe bû. Li hemberî hemûyan him nerm, him jî hişk û tûj bû axa. Gotinen xwe di sere xwede rez dikir, pe qayil nedibû, ji nüve rez dikir. Gundiyan gerek bizanbûna ku ewbi qerare, beheneke û ji bere zexmtire niha. Gundiyen xwe hez dikir, ji bo wan difikrî, le bele bi awakî dine jî nedibû. Ew be qerariya wî, gundî he zede dikire şike. Yek duda bi dest û çavan, bi pis te pista di nav xwede, tirsa xwe ji hevdure digotin. Ûsiv axa qutiya titûne bi dor şande peş rûspiyan. Wan jî di hav tiliyen xwede cbcaren nû dipeçandin, deste xwe dibirin ser sînge xwe û ji axere dua dikirin. Her diçûn zede dibûn.

Ji ber dûye cixaran, germa lambe hedî hedî xwî didan. Le axe dîsa jî nedikarî tiştekî bigota, nedikarî destpe bike. Li cem axe mele gund

11

rûniştibû. Küre axe, ye mezin xizmete gundiyan dikir. Li alikî jî di bin çavande li gundiyan dinerî. Fate bi küre xweve hatin û li jere, di cîkî tengde, U ser çoka pişta xwe dane dîwer.

Ûsiv axe bi destmala xweye qirmiçî eniya xwe, rûye xwe ziwa kir. Paşe du cara bi dengekî ketî kuxiya.

Cîranno, hûn hemû bi xer hatine. Dibe ku kare we hineka hebû.
Qet nebe bi vî sebebe eme hale hevdu bipirsin. Hemîd, xwede xweşiye bide, îro tu çûbûyî ser doxtir, qe ne go çi?
Tu saxbî axa. Got ku gurçiken te serma girtine. Birek derman nivîsî. Got ku tûj mexwe, tel mexwe, kem bixebite û xwe newestîne. E nexwe, neweste, eme çi kule bixwin. Ye me ne tu işe axa, ma tu saxbî.
Gotina min eve, ku em ji berede cîranin, hûn gundiyen minin.
Gelek rojen meyen şînî û şayî bi hevre derbas bûne, min dile hinekan ji we şikenand. Le tişte wisa li kîjan gundî nabin ku? E, de bejin, gun dî eðer car caran şer û giliyan nekin, qet dikarin bijîn?
Zor da xwe û bi zore keniya. Di bin çavanre li rûye giştan dinerî. Di destpekirinede deve wî zuha bû, dile wî dîsa hate givişandin. Leven xwe dadilest, bi tüyen xwe dilîst.
Di ve demede em hemû gundî ji erde ter nabin. Min erd daye we hemûyan. Hûn jî heqe min didin. Le bele hûn gişt jî carcara gazina dikin. Ku erde we, mergen we kemin, zuhane, beavin. Ez jî mîna we. Le dine mezin bû, xwastin û ihtiyaca jiyane zede bû... Wilo pir jî nakeve deste min...
Wexta ku evgotin gotin, bi xwe jîbavver ne dikir. Lewra jî denge wî diket û dilerizî. Careke din jî li dora xwe niherî.
Ne vvisaye? cîranno!
Mele gund, nobedar û çend meriyen kal sere xwe hejandin, 'Nişa ne, axa wisane", dixwastin bejin. Hemû bedeng bûn. Cixaren wan di nav tiliyande û çaven wan her vekirî bûn. Eve heta kedere biçûya. Gelekan
ji wan tedigehiştin ku ewe tişten nebaş bibîhîzin.
Ewqas derd, kul tiştek dabû wan. Ji berede gelek tişt fem dikirin, texmîn dikirin. Xeteren mezin hedî hedî ten. Wisa ten ku meriv wan

qebûl dike, dikşîne. Gundiyan ev hala rind zanibûn. Le axan, began ji wan zedetir zanibûn. Her tişt ji hale Ûsiv axa rind dihate kifşe.
Hûn zanin, ev erdana yen bav û kale min û yen minin. Gotinen min evin ku dine diguhure, mal û peçûyîna zarokan ji bere zedetir dixwaze.
Bawer bikin ewen ku hûn didine min, tera me nake.
Tûka xwe bi zehmet dadiqultand. Kevana bi zehmet, pir nemabû. Dawiya weya hesa bû. We gotinen xwe yen dawiyc rehet bigota.
12
Gundiyen ku di ode û hewşede rûniştibûn, şaş û metal man. Cara peşîn bû ku birçîbûn, tazîbûn, begomanî, nişkeva derketibû peşiya wan. Bele. Birçîbûn. Hale wan ne baş bû, le bele dîsa jî genime xwe, savvare xwe bi dest dixistin, dikarîbûn kem an zede tiştekî bidin zaren xwe. Ter nedibûn, le ji birçîna jî nedimirin. Ye wan nîn bû erd, dîsa jî herkesekî tera derbaskirina rojen xwe hinek erd dajotin. Niha, gelo ewjî ji deste wan diçû? Ditirsiyan ku li rûyen hevdu biniherin.
Bele, gotinen min evin ku eva weha nabe. Xwede rizqe hemûyan daye. Kes ji birçîna nemiriye. Eze Beriya Sor û zeviyen peş gund, zeviyen li aliye günde Zîlane, bi traktöre xwe bajom û biçînim. Eze dî sa jî tera we, li dora Ziyarete, li dora wî gire paşîn hinek erd bidime we. Hinekî beave, hinekî bi kevire, le bele qet nebe dîsa jî erde, zeviye. Erde xame. Eðer hûn baş le bixebitin, hûne demekî kurtde wira ji kevira paqij bikin, dûre şovkin, zevîkin. Hûn doste de û bave minin.
Min got ku ez ji nihave xebere bidime we. Di peşiya mede zivistaneke direj heye, paşe bihar te. Bihare bira kes deste xwe naveje ew ciyen ku ez dibejim. Di wextede xeber dayîn, heqe cîrantiyeye. He hergan destpe nekiriye, dive ve yeke bizanibin.
Xwîdaneke wilo bi ser Ûsiv axade hatibû... Le niha rehet bû, dawiye

jî bira ew bifikrin.
Hewake giran li ser ode girt. Hinekan çöken xwe guhartin. Cixaren xwe teze kirin. Ev xwastinen weha qet nedihate bîra wan. Çilo dibû? Hinekan ji yen li tenîşta xwere tiştin digotin. Le kesîji cematere tiştek nedigot. Giştan li hevdu dinheriyan. "Cima kesek li dij neheqiye naqîre" difýkrîn... Yekî li rûye ye dine dinerî. Ev bedengî li Ûsiv axa nexwaş hat. Careke li aliye xweye raste, careke jî li aliye xweye çepe niherî. Paşe küre Feqî sere xwe bilind kir. îro ji doxtir hatibû. Qet rojekî jî cîranekî xwe neeşandibû. Bedeng û beziman bû. Bi nimej û teeta xwe dabû.
Axa, tu zanî, em gişt feqîrin, xizanin. Ew zevî jîxwe me ter nakin. Dibe ku tu qasî axayen dine gelekîji me nastînî. Le erde vî alî wisa zede nade. Cima, ye me zedeye em nadine te? Li dine darekî meyî ter, heşîn tüne. Rind an xeraw ew erde ku rizqe me dide, em wîjî nejon, îcar eme çi bbcwin? Beje axa, eme kuda biçin? Li cem xwede û pexember, dîn û misilmantiyede ma em gişt ne birane. Ma heqe cîrantiye li ser me gişta tuneye?
Zede nikarîbû beje. Ewqas direj xeberdana wi jî kesîheta niha nedîtî bû. "Welle raste", "Em gişte bimrin". "Ev kirina jî ji ku derket?"
13
"Eme qir bin" Ev gotinen ha di odede dihate bihîstin. Destpekirina xeberdana
wilo, te digot ku deve tere vekir.
Mirte mirt herçû bilind dibû. Ûsiv axa xwe bi hers danî, nedixwest ku hevsar ji deste wî derkeve.
Cîranno, hûn li mala minin. Ji ber ve yeke ez tiştekî nabejim.
Eðer derden we an jî gotinen we hebin, bejin. Ez çi bikim? Li mal û milke xwe nebim xwedî? Ev çi hale, li kîdere hatiye dîtine?

Deng hatibû birrîne. Revvş ewqa ne baş bû. Kesî nedixwest xeber bide, bere peşin. Ewxwestina xeberdane ya gava dine vvinda bûbû. Le bele, xebernedan jî qebûlkirina gotinen axe bû. Bi dûre li dij derketin befede bû. Wan ev yeka rind zanibûn Gava meriv di destpekede li dij derneketa, paşe zehmetir bû. Gundiyan baş tedigehiştin ku ye ku derba peşin ledixe, şer qezenc dike, ye ku berî gişta qîze dixwzaze, distîne. Poşmaniya dawî befedeye.
Hemûyanji xale Mihere hürmet dikirin. Kal bû, diran di devde nemabûn, rûye wî qerçimî bûn. Dujinen wî hebûn; le xwede zarek jî nedabû. Zarek jere bûbû, le pir nejiyabû. Çi bûye li eskeriye bûye, digo tin. Ew bi biraye xweve malek bûn. Heyşt zared biraye wî hebûn.
Xale Mihe çu cara şewqe xwe rast nedida sere xwe. Kesî nedizanî çimaşewqe wîli alîkîdiket. Jijendirman gelekîditirsiya, ji tirsa kujendirmed we ji nişkeva bene gund, şewqe wî her tim li serî bû.
Axa xwede emre te direj bike, xwede zaroken te bihele. Tu merivekî başî. Le baş bizanibe ku rehmetiye bave te buya, weha nedikir.
Tujî... Gerek tu jî wilo nekî. Ew gundiyen ku erde wan tunebe, we çi lo bijîn, Ûsiv axa? Çawa dibe? Gundî çu car be erd nabe. Qet be erd nabe. Rezü dibe. We li germa Edene, li ber dîwaren Diyarbekire, Rihaye perişan bibin, qir bibin. Nexweşî, taye giran we gişta bikuje. Tu bawerî ku namus, heya we bimîne? Rehmetiye bave te awha nedikir. Namusa me gişta yeke, axa! Were ve yeke li gundiyen xwe meke. Tu li axed xelqe nenihere. Wan dest ji dîn û îman berdane. Ewe di dojehede bişewitin. Ez qurbana herdu çeved teme. Ve xirabiye meke. Dest ji ve makîna kafira berde. Ke xer ji wan dîtiye? Ev makînana urf û edeten me xirab dikin. Benamûsa ji bo çi îcad kirine? Kevir bi ser wande bibare înşala.
Piste pist kete ode. Deng dîsa bilind bûn. Paşe axe deste xwe bi

lind kir, deng hate birrîne. Yekî duda dîsa kin û kurt axaftin. Hine kan digot, eme bimirin. Hinekan saleke din jî mühlet dixwastin. Ka len nevalen bave Ûsiv axa, bi lava kirine dixwastin ku wî hinekî nerm bikin.

14

Edî wext dereng bû. Denge Fate, ku dişibiya denge mera, bi qît qîtî bilind bû.

Axa, axa... Tu ji xwede qet natirsî? Risqe sedûbîst malan dibirî. Ev çito axatiye? Ji bona ku hinek zede qezenc bikî, dixwazî meriv bimirin. Wîjdana te çawa qebûl dike? Me hindik ji tere xizmet kir? Ji bo te em mirin. Ne beşe edî, tu çi dixwazî? Ew etîmed mere min, ku ji bo te mir, ber kîjan dîwarî, li kîjan kûçeye ji bo parse deste xwe direjî xelqe bikin? We çaxe xelqe ji tera çi beje? Paşe... Paşe tu dizanî ku...

Li vedere tuka xwe daqultand, tişten ku dihatin ser zimane we, gelo bigota an na? Ewqas mer hebûn, yekî tiştek nedigot. Çiqas ser me, ew çi ton merin? Tiştek nedigotin, difikrî Fate. Deng nekir. He mû li alîwe zivirîbûn, li deve we diniherîn. Hemiyan dixwest ku Fate gotinen xwe nebirre. Fate hinekî peşde derket, li ser çöken xwe seki nî; deste xwe rakir û li kulev xist.

Tujî dizanî ku ev erd hemû ne ye teye. Ma hindik şer çebû li ser van zeviyan. Te ji dest me girt. Paşe jî te gundî kirin hevpare vî erdî. Dûre sere te û gundiyan sekinî. Niha linge te erd girtiye, herin, bitey sin herin, dibejî tu. Ewqas mer hene, ew gişt dikarin herin, le bele, ez û herd etîmed xwe naçin. Ev makîna teye, traktora teye, çi belaye, hetanî ser cinaze mere derbas nebe em van çend evvlek erde xwe terk nakin.

Fate di deste küre xwe girt û ji ode derket. Hemû şaş û metal mabûn. Dîsa piste piste di odede dest pe kir. Ûsiv axa bi hers got:

Ev jina hertim behsa çîroken bere dike. Nizanim cima? Tim mirina mere xwe ji min dipirse, çi dixwaze? Çî min peketiye? Ez çi dizanim cima miriye, çawa miriye? Dîsa jî min got cîrantiye, ewqas pey ke tim, min zared we pirsî, xwedî kir. Meren hemûyan dimirin, qe ne te ne mere Fate miriye li ve dine. Hela hûn gotinen ve biniherin. Na şer û hing bûne, erd ne ye min bûye!

Li jin buna xwe nanihere, sere hefteheft bave xwe zedetir diaxive. Ez li male xwe, erde xwe dibime xwedî. Ji bo we jî ne baş dibim, ev çi dinyaye?

Mele gund dest ji ruye xwe kişand.

Heşa, heşa, got. Gişta, ka mele çi dibeje, meraq kirin û li aliye wî niherîn.

Welle gotin eve ku... Bele eve ku... Dîne me, pexembere me emir dide ku dive kes çev bernede male kesî, milke kesî û qurşekî kesî. Misilmantiyede ev tüne. Li dinya dine ev mal û milk dibe derzî û di çeve

15

merivanre diçe. Dive kes ji heqe xwe zedetir nexweze. Çevternebûn ne başe, qet ne başe. Li dinya dine îman lazime ji mere.

Ûsiv axa bi nermî li mele niherî, sere xwe pere hejand. Bi kef çev li gundiyan gerand. Meriv di çeved wîra dikarîbû bixwîne ku dibeje, "Vaye, gotinen min gişt rastin".

Mele deste xwe di ruye xwe dida û di bin çeved xwere li gundiyan meze dikir. Her roj, wexta nimeje, ew cîran li pey wî disekinîn. Her tim ewan hale wî dipirsiyan. Niha jî li hember ve pirse ew serberjerin. Hemû gundiyan bi meraq û şik bûn. "Te riya dîn û îmane nîşanîme di da. Tu çawa dikarîbi ve neheqiye razîbibr, gundiyan dixwestin ji me lere bejin.

Güne mele bi gundiyan hat. Le ya rastý jî wisa bû. Ûsiv axaji eydan peve carna jî di nimejen înede bejdar dibû. Gundiyan pere, genim, kine didane mele. Axe jî carna alîkariya wî dikir, xwede je razî be. Le bele çi gunahe van belengazan hebû?

Le mezinen me gotine ku pez be şivan nabe. Gerek şivan li pez rind xwedî derkeve. Wan nede guran. Wanji bîr neke. Pexembere me dibeje ku heqe cîrantiye ji bîr mekin û ji mezinen xwere hürmete bikin. Qedre wan bizanin. Çev bernedin qirşekî çu kesî. Ez dixwazim bejim, ku bira axaye meyî mezin hinek erd ji gundiyanre bihele. Bira bi erde mayýnjî cîranjiyana xwe berdewam bikin. Be goman heqe axeye. Ji erde heta ezmana heqe vviye. Le bele, hûnjî gundiyen wîne. Ge rek nehele ku hûn biçin di xeribiyede perişan bibin. Ew ciyen ku axa dibeje, bira hinek erd ji were bihele û hinek jî bi traktöre ji xwere bajo. Em ve yeke ji axaye xwe ye bi merhamet lawa dikin.

Li ser axaftina mele, axa piçekî dilteng bû. Dawiya xeberdana me le heznekir. Be deng ma wilo. Paşe heq da mele. Ji ber ku mele axa ji bin barekî giran xilas dikir.

Ev tişta bi carekî nedibû. Ma cima mele ji gundiyanre negotibû ku "Eðer hûn çev berdin qirşekî axe, cîhe we dojehe". Bele, wisa gotibû. "Axa rast dibeje, ji erde heta ezmana rast dibeje", gotibû mele. E, hi nek güne te li wan be, hinek ji wî erdî baş ji gundiyanre bihele. Le eze çawa bihelim vî erde baş. Eze çawa erde xwe bidim gundiyan. Nikaribû bide wan. Lazime mecaleke bibînim û bifikirim. Bele, bi lez qerardayin ne başe.

Cîranno, min xeber da we, eva deyne stuye min bû. Min bi cî anî. Güne min bi we te. Ji bo ve eze bifikirim, ku çiqas erde ji kîjan dere bidim we... An jî nedim! Eze van gişta bi xwe xwe bifikirim, dîsa jî ji were xebere bişînim.

16
Hemû bedeng û kerr bûn. Ji deven wan "De bi xatire te" jî bi zeh
met derdiket. Ji hev veqetiyan, yek û yek çûne male xwe. Mele parra
ma.
Çawa hemû cîran çûn, küre axe ji herduyanre qahwe çekir. Li çe
ved hev dinheriyan, "ewqas xirab jî nebû", digotin.
-IVBere,
li van dera ermenî û kurd tev dijiyan. Kînge dest pe kiriye,
kes nizane. Le ev yeka baş te zanîne ku ev ermeniyen U vira dijiyan,
çandina herî baş dikirin. Di nav wande gelek hunermend hebûne.
Seraba baş çedikirin, xwedî rezen rind bûn. Bastiqen wan gelekî paqij
bû. Hesinkerî, nelbendî, dikandarî, necarîû karen wisa di gun- dande
gişt di deste ermeniyande bûn. Hal û wexte wan pir xweş bû. Hi
nek ji wan gelekî devvlemend bûn. Li gelek gundan, ji çend malan bigire
heta piraniya gund ji ermeniyan bûn. Wextekî bere, herçend dî
ne kurdan û ermeniyanji hev cüda bûn jî, le bele bi hevre baş bûn. Cîrantiya
wan xweş bû. Di cejnande xweşiya hev parve dikirin. Di şînen
hevde li ba hevdu bûn. Ev kirîvtiya di nav wande, dostî her zede dikir.
Ya rastî hinek kurdan wexta zared xwe sunet dikirin, ermeniyen dewlemend
ji xwere kirîv hildibijartin.
Ew hevjîna baş, di dawiya qurna 19 ande ji aliye devvleta Osmaniyande
hate xirabkirin. Padîşahe wan, Siltan Evdilhemîd qirkirina er
meniyan plan kir û bi nave misilmantiye erîşeke giran bire ser erme
niyan û dest bi qirkirina wan kir. Di van erişande, dewleta Osmaniyan
hinek axayen kurd jî bi kar anîn. Hîn jî dibejin axayek li Mûşe bi nave
Hecî Musa hebûye. Hecî Musa axakî bi navûdeng bûye, di wexte xwede

li Erzorume bi Mistefa Kemalre kongrek çekiriye. Ewî axayî, qîzeke ermenî bi nave Güle bi zore revandiye. Le keçika ermenî "Ez sere xwe nadime ser balgiye mere misilmana", gotiye. Gelek bûyeren weha nexweş di qirkirina ermeniyande qewimîne. Di dawiya fermana er meniyan çu ermenî li we mintiqe neman. Yen hatin kuştin, hatin kuştin, yen mayîn mal û milk û günden xwe hiştin û reviyan.

Le wilo... Mal û milk û günden kuji ermeniyan man, kete deste dewlemendan.

Tendurek jî yek ji wan gundan bû, ku kurd û ermenî tevde tede dijiyan. Hinek ermeniyen dewlemend, xwedî erden fýreh hebû ne. Ermeniyan him tirkî û him jî kurdî baş dizanîn. Carna meriv nedizanî wekî kî ermene, kî kürde.

17

Li Tendureke yen feqîr jîxwedî hinek erd bûn. Le ne tapiyen erde di deste wande hebû, ne jî kesî pirs dikir. Reberen herdu aliyan jî ba ca xwe dişandine ji hukumatere. Le gişt jî ji qeyd û defteren bace be hayadar bûn. Ne wanji hukumate tiştek dixwast, nejî hukumateji wan. Piştî fermana ermeniyan, xelqe Tendureke, axa ermeniyan di nava xwede parve kirin. Erde herî baş be goman kete para dewlemendan. Bele, Osmanî çûn, cumhuriyet hat. Di jiyanede guhartinek çenebû. Ferman dîsa di deste zordest û devvlemendande ma. Ji xwe dest û piyen hukumate jî nedigehişt her dere. Bi teybetî jî di salen peşîde. Ke zora ke bibira, ewî qezenc dikir. Pere hemû derî vedikir, kare axa û bega mîna bere baş bû.

Paşe xeberek belav bû. Axa xezîne û axa ku ji ermeniyande maye, we li gundiyen be erd be parvekirine. Le bele ewjî nebû.

Di destpeka cumhuriyetede, li Kurdistane serhildana Şex Seîd hate li dandstin. Peyre rojen gelek teng û giran hatin. We deme, bave

Ûsiv axa bi hukumatere bû, alîkariya leşkere rome dikir. We deme hu kumate biryarek derast û hemû axa û beðen kurd ber bi rojavaya Tirkiye nefî kirin, bave Ûsiv axa jî di navde. Herçend bave Ûsiv axa alî kariya hukumate kiribû û çûbû cem walî û qûmandara, le dîsa jî ji nefîbûne rizgar nebû.

Bi nefîbûna wî, gundî piçekî rehet bûn. Le dîsa jî memur û berpirsyaren hukumate mîna bere man. Guhartineke mezin çenebû. Deng û baniyen xwe nedikirin gundiyan. Bi kare xwe mijûl dibûn. Bere karen xwe yen li cem hukumate bi deste axaye xwe didane kirine. Niha betir ditirsiyan, ji hukumate direviyan. Hinek ji wan nîşan nedidan, le şa dibûn ku we erde axe bidine wan. Bawer nedikirin, wisa jî bû. Ew erd nedane gundiyan. Le hedî hedî güne wan bi axe dihat. Erd, mal û mil ke xwe terk kiribû, bi zore şandibûn rojava. Herçend axe ewqas alîka riya hukumate jî kiribû. Carna ku fýrset dikete deste wan kare mala axe jî dikirin. Hatina zevî û erde wî bi dizîkava jere dişandin.

Qederek derbas bû. Hukumate axa hemû efû kirin û axa bi şunda vegeriyan. Ûsiv axajîbibave xwere hatibû nefî kirine. Ewjîvegeriya. Ew li Denizliye mabûn, di dema surgunede. We deme Ûsiv axa tirkî hîn bûbû, bajaren mezin dîtibû, çeve wî betir vebûbû.

Piştî vegera axan, gundiyan ji wanre hurmeteke mezin nişan dan. Hemûyan jere pez, beran, çelek dibaxişandin. Gişta pere didane axe. Di şbaýle wîde ji bere betir dibeziyan. Li ku erdekî baş hebûya, drxvvestin ku axa ji xwere bajo û biçine. Erd zede bû. Tapiyen kesî jî tu-

18

nebûn. Mal, male wan bi xwe bûn, le kesî tapî, qeyd, defter nedihanî bîra xwe û kesî jî nedipirsî.

We deme bave Ûsiv axa dimire û berpirsyariya male dimîne di des

te Ûsiv axade. Wî, bajaren mezin dîtine, tirkî dizane û ciwan û bi xeberdane.
Di nav çend salade erde gund gişt kiriye deste xwe. Ew hukumata
ku Ûsiv axa şandibû rojava, niha gotineke wî nedikir dudu.
Mudire tapiye, qûmandare jendirman, qaymeqam, gişt bûbûn doste
wî.
Çend gundiyan bi daxwaza axe hesiyan, li hember sekinin. Le di qereqolande
hatin hingavtine. Hinekan gund terk kirin. Paşe mudire ta
piye aqil dabû axe. Ji bo ku zîliyeta erde heq bike, kaxez bi gundiyan
dabû morkirine, ku erde xwe bi îcar dabû gundiyan. Bi tiliyen xwe ev
kaxiza qebûl kiribûn gundiyan. Wan rojan, çawişe qereqole, ku bi çawişe
zer dihate nav kirine, ji bo xatire axe çend şevan gundî di qereqole
hingavtibû. Gundiyan nikaribûnbi axere serederîbikin. Paşe des
te xwe ji her tiştî kişandin.
Le gundiyen nû hîn bûbûn ku ev kared weha di dadgehande tene
halkirine. Ji bo we jî pere, abûqat pewîste. Hersal kara xwe bi axere
parve dikirin, xenji ve tiştek ji deste wan nedihat.
Gundiyan ew Rewşa bi zore qebûl kiribûn. Herçend wan dizanî wekî
ku ev erd, erde wane, le tiştek ji deste wan naye ku erde xwe texin
deste xwe. Demeke bere, gundiyan bi hevre çûbûn dest dabûn ser er
de xwe. Le jendirme hatin û erd ji deste gundiyan girtin û dan Ûsiv
axa. Ev yeka bi ewraq û zabita jî hatibû giredan. Le bele axe jî dizanî
ku qiymeta van ewraqan tuneye. Le dîsa jî ji bo xatire wan ewraqan
gelek pere serf kiribû. Erd bi deste gundiyan dihate çandine, axe jî pa
ra xwe je distend. Bi ve çûyine kesî deng nedikir. Le awha jî nedibû.
Axayen dine
traktör, makîneyen ku xwe bi xwe diçine, kirîbûn. Qezenca wan her

zede dibû. Gerek wî jî wilo bikira. Erde awha di deste kede hebûn? Zevî mergen bi av bûn. Hatina wan gelek pir bûn. Meriv traktöre nekire jî dibe. Bi kirekirine jî dibû. Bange, hukumate alîkarî dikirin. Ax, carekî ji bîna deve van gundiyan xilas bibûya...
-VBi
şev Fate bi hers hate mal. Kelogirî bû. Ev çi jiyan bû? Ve jiyane ew xwaribû û teva kiribû. Di van salen dûr û direjde ne kesî hale we
19
pirsî bû, ne jî we hale kesî. Xwest ku küre xwe li cem yen dine ramedîne. Küre mezin hişyar bû, bi çeved nîvxewî li herduyan niherî, le ti ştek fem nekir. Fate sterked çeved xwe bi leçeka xwe ziwa kir. Nedixwest ku nişane zara bide. Paşe zarok ketine xewe, le xew nedikete çe ved Fate. Ev dinya cima awha benamûs bû. Başbûn, jiyana bi namus û rûmet li ku mabûn. Gundiyen ku alîkariya we dikirin, ne ku tunebûn, hebûn. Hebûn, le ji desten wan tiştek nedihat. Ew jî mîhanî we bûn. Desten wan di paşila vvande bûn. Sala ku mere we mirîbû, ew ciranen ku bi niyeteke xirab le diniherîn, hatine bîra we. Ewqas mer ku bi axakîre serederî nekin, jinebiyeke feqîr we çi bike? Bîhistibû, dizanibû ku yen mîna van axan hemû xirabiyan dikarin bikin. Ye sere xwe hilda, we bi kuda biçûya? Qet... Ma di dinede cî mabû ji bona we?
Xale Mihe riya male girt. Mînanîyen ku di xewede diðerin. Ji xwede gelekî ditirsiya. Ev Ûsiv axa cima qet ji xwede natirse, qet naye bî ra wî ku xwede we ceza bide wî, difikirî xale Mihe. "Tobe, tobe, xezaba xwede we le be". Cixara xwe kişand, dibinijî. Hedî, hedî heq da axe. "E, ma ev derana ne ye wîne? Memur razî kiribû, ruşwet dabû, giriya bû... Le paşe bû xwediye van deran. Ma wisa nîne? E, ma li male xwe nebe xwedî? Kirina me, gotina me çi beşeye?" Te digot wekî yekî di ne bi hundire mejûye wî dihesiya. Sorbû, bi ser xwede hat. "E, eðer heqe

wî heye, ye neheq kiye? Em! Dema heqe wî heye, em kuda herin, em çi bikin?" Kire of û pof, di dawiyede kete xewe.
Küre feqî, Ma gelo min baş kir gava hemberî axe derketim? bi xwe xwe digot û difikirî. "Le ku gundî hemû herin ji axe lawa bikin, wî razî bikin, we hale mine çi bibe?" Cima wilo kiribû, difikirî. "Min baş kir. Gelo meriv çilo bera gundiyen xwe dide. Bijî Fate. Rast digot. Ya rastî erd ne ye axene. Welle xwede her tiştî dibîne û dizane. Le eðer axa gotinen xwe bi cîbîne, eze çi bikim?" Şer û lexistin heznedikir. Siheta wîjî ne baş bû, doxtir jere gotibû ku zede nexebite. Li bajer dewduten wî hebûn. Kînge tekeve tengasiye dikaribû here cem wan. Qet nebe we jere karekî bibinin. Çend cara, "Te heta kînge li gund bi', je re gotibûn. Xwede bela zordaran bide. Çawa hebe li bajer zorbetî tü ne, kes tevî kare kesî nabe. Her kes keda xwe dixwin. Bele ya rastî çûyîna bajere. Lewra gotine: "Te bimirî, li cîkî mezin bimire, te bixeniqî, di aveke mezinde bixeniqe". Xwestina xwe, qerara xwe ji nihade ji kesîre nedigot. Hîştibû deme.
Şükriye nobedar kare mala axe xilas kir, der û dor berhev kir. Piştî ku Ûsiv axa destur daye, ew jî hate mal. Iro gelekî vvestiya bû. Mal bi mal geriya bû. Hinek malan du cara çûbû. Lempa lokse kare wî bû. Di
20
hundirde qet rûneniştibû, virde wede çûbû: derî veke, ave bîne, here vvira, were vira... Bele heqe axe wî bû, erd ye wî bû. Çawa hebe axa dest nade ser erde wî, zeviyen wî ji dest nagire. Ewqasî dkebite, xizmeta axe dike. Elbet axa jî we ferqekî texe navbera wî û gundiyen din, difikirî Şükriye nobedar. Dile wî teng bû, le got, eðer axa erde wî jî ji deste wîbigire? Ew çi hale, çi jiyane, heta meriv dibe nobedare gund, çetire meriv bibe kuçike ber pez. Ne sibe, ne evar, ne jî zivistan û bihar heye. Davviyede yekî ku qiymetekî bi penc qirûşa bide jî tüne. Ji

na xwe ya jarok û zirav hişyar nekir, kete nav ciyan. Difikirî, "Ji xelqere çilo, ji mime jî wisa."
Piştî we şeve, gelek gundiyan xwestin ku herine bajer. Ya rastî erd û zevî kem bûn. Li bajer qezenc baş bû. Rojekîde kulmek pere dike te deste merivan. Xortan mejve dixwestin herine bajer. Lewra jî li ge lek malan xeberdanen tûj dihate kirine. Hinekan, "dimirim, dîsa jî ji gund naqetim", digotin. Hinekan jî, "çi dibe bira bibe, eme herin", di gotin.
Soro, li mala axe qet xeber nedabû. Bedeng, derde xwe avetibû hundire xwe. Te digot ku qet tiştek nebûye. Heta dawiye guhdarî kiribû.
Ew û cîrane wî, Huseyn giran, giran berbi jor diçûn. Dîsa jî xeber nedidan. Wexta hate mal, bûyeren qewimî anîn ber çeved xwe. Axe di dawiyede re nîşanîwan dabû, wekî texmîna wî. Hinekî jî dereng mabû axa. Li Edene, Rihaye, Diyarbekire û li ciyen mayîn axan ji mejve bera gundiyen xwe dabûn.
Jina wî tegîhişt ku mere we hers bûye, çiqasîji we veşere jî. Soro cixara xwe kişand. Egîtiya Fate hate bîre. Di dile xwede, ev cara peşin bû ku xwest jina wî jî awha bibûya. Jina wî jîr, gotineke wî nedikirin dudu. Dibe ku ji Fate jîjîrtir bû. Evana ji bîra xwe denrist. Yen bûyî yek yek ji jina xwere got. Kînge wilo dikir, di dawiyede rehet dibû. Ji na wî ew baş nas dikir, lewra xeberdana wî qet nebirî. Got, dîsa got. Fate gotibû, ku "heta li ser cinaze minre derbas nebin, kesek nikare erde min ji deste min bigire". OJriya bû. Deste küre xwe gitrtibû û ode terk kiribû. Lawakirina kalan... Le ew hale mele, tirsonekiya wî û alîkarîkirina
wî ya axe çi bû? Di dawiyede wî çend gilî ji bo gundiyan go tibû, le ke bi durûtiya wî bawer dikir? Sibe U cem me xwede zane we çi beje?

Soro merivekî serwext, pir bi dîqet bû. Ew tişten ku gelekî piçûk û kes nabîne, bala wî dikişandin. Dixwest ku hinek tiştan di nav gotinande bibîne. Evvî hinek rewşen ku qet naye bîra kesî, didît. Gelo çi we bibe? Ji wan tişten piçûk texmîn dikir. Ji ve yeke jî qet zirar nedidît.
21
Ew tişten ku meriv gelekî li ser nasekine, Soro mane je derdixist, ge lek caran. Cîran û jina wî, ji vî aliye wî pir hezdikirin. Dixwestin ku ew jîwisabin.
Mele xwestibû ku ne ew bieşe, ne jî ye dine bieşin. Ya rastî nepakî ji gundiyanre kiribû. Le hela mayina wî li mala axe? Xelq hemû çûbû, ewji ciye xwe nelivîbû. Soro gelekî ketibû şike. Ew hinekîji male dûrketibû,
zivirîbû, le niherî, le mele ji male derneketibû.
Gundiyen xwe rind nasdikir Soro. Ew ne li hemberî axe disekinin, ne jî daxwazeke wan wisa hebû. Soro li ciye xwe, xwe direj kir. Ev deh salen dawî hatin bîra wî. Qet ji ber çeved wî nediçûn. Çaved xwe digirt, le dîsa jî ew rojed tengasî û yed baş bi hevre dihatine peş çeved wî.
Soro, berî mirina bave xwe bi du gundiyen xweve, reviyabû çûbû Edene, ji bo xebate. Niha ew li bajer rûdiniştin. We li we dere bbcebitana, hinek pere bidana ser hev. Beriya wî we pere bidîta, we hinek kincen nû ji xwere bikiriya. Le nedixwest bave xwe jî ji bîr bike. Ede ne, bajarekî gelekî germ û qelebalix bû. Pembo komkiribûn. Ew merive ku Soro li cem kar dikir, pere Soro gişt nedabû, destvala mabû.
Paşe li fabrîqayeke konserveye dest bi kar kiribû. Bi xwe zexm û xurt bû, lewra jîkare giran tim dikete para wî. Careke, katibe fabrîqaye heqe Soro û nevalen wî rast nedaye, wan çar hevalan jî ew hingavtin û paşe jî ji kare xwe bûn. Xwezil bi we bima. Xwezil qet tiştek nekirana,

sere xwe hildana û biçûna cîkî dine. Roja din, li cem polîs îfada wan hate girtin. Katibe fabrîqaye bi serde jî ew sucdar dikir û digot:
Van herçaran we fabrîqe bişewitandana, min ew girtin.
Nobedare fabrîqe û yekî dine, heta niha ew nedîtibûn, wan jî şahi di kirin. Gotin, Bele wisa bû. Soro, ev bûyerana di ber çeved xwere derbas dikir. Dewsa ku heqe xwe bistînin, niha jî bi şevvitandina fabrîqaye dihatin sucdarkirine. Li cem polîs ketibûn halekî gelekî belengaz.
Soro û hevalen wî penc meh di girtîgehede mabûn. Di girtîgehede, girtiyek hebû ku xelq gişt li dûrî wî disekiniyan. Digotin ew "siyasiye". Ew hate bîra Soro. Wî her tim ji Soro û hevalen wî, erde wan, günde wan dipirsiya. Ya rastî ev erzihala ku ewî "siyasi' ji wanre nivîsîbû, ge lekî bi kerî wan hatibû. Kem xeber dida. Pir caran guhdarî dikir. Ge lek cara: "Ku meriv bi aqil nebe, axa merivan perişan dikin, biraye min", digot. Soro ketina xweye girtîgehe ji bave xwe, ji gundiyen xwe veşartibû. Ew herdu hevalen wî zûtire vegeriyabûn gund, paşe birçî û tezî ew jî hate gund.
22
Min du xorte xelqe Edene ker kir, lewra di girtîgehede çendekî razam, gotibû ji yen ku je dipirsiyan. Hemû dîsa jî wisa dizanin. Taqet nedikir, ku qala şewitandina fabrîqe, sere xwe û katibe fabrîqaye bike. Ditirsiya, baş nedibû. Soro ferq nedikir, le ew bûyeren li Edene gelekî tesîrî wî kiribûn.
Xew nedikete çevan. Li alî raste û çepe dizivirî. Ji alî tewle denge dflca dihat. We çi bikira? Bele, ew cîranen wî, ew cîranen wiye melomestî...
Le bele her tişt ewha dest pe dikin, paşe her diçe dikeve re.
Yed baş di destpekede kemin. Paşe zede dibin. Eðer ku cesur derne kevin, bazar ji herkesîre vedibe. Ve neheqiye gerek cîran qebûl nekin.

Nişkeva xwe ter û can dît. Jiyana xwe anîbû bîra xwe. Yed ku ve evare bûyîji bîr kir. Wekî gişt xirab û sistin, le Fate ji ku derket?
-VIRoja
dine û rojen peş, li gund hewake giran hebû. Kesîxeber nedida, kesî henek nedikir. Karen xwe yen roje jî nedikirin. Hedî hedî ser maye we dest pe bikira. Li ber dîvvaran, li hinek malan, yen ku dihatine ba hev, bi hers bûn. Bedeng, heyfa xwe ji cixaran derdixistin.
Ro nîvro bû. Li ber dîwarekî civiyabûn. Hinek ji wan li ser dare erebe rûniştibûn.
Ev yeka naye kişandin, biraye min naye kişandin.
Raste, le bele eme çi bikin? Keremke tu beje.
Yekî, bi qirşe di deste xwede erd dikola.
Ax, de û bave feleke... Ev çi bebextiye? Bi dek û dolaban nahelin em erde xwe biçînin. Kî bera ke dide?
Oro, zarno! Em çiqas exmaq bûne, be aqil bûne! Le de û baven me? Ewji mejîârabtir bûne. Wexta ku axa nefîkiribûne rojavaye Tirkiye, "Lo gunehe, lo cîrane", digotin. Ji hukumate bi dizîjere pere, tişt komdikirin û dişandin. Rûn û penere v/î ji vira diçû. Gundiyan bi xwe nedbcwarin, ji wîre dişandin. Welleh ev dinya benamûse. Gava firsend bi deste meriva dikeve, meriv bi kar nîne, paşe xelq awha tîne sere meriva.
Bise, bira ji bevîla mere bîne. Tu bisekine ji parra he çi te?
Ez ve we nizanim. Gotin hesaye. Eva fermana mirina meye. Mînanî fermana Siltan Evdilhemîd, mînanî ibrahim Paşaye Millî.
Te bibînî, gundî ve yeke qebûl nakin. Kî dizane we çi bibe?
Lo, tu qe ji xwede natirsî! Beje, hela te ev îcada ji ku dît?
23
Ox, ox... Gundî qebûl nakin! îca we çi bike? Hişe xwe komî se

re xwe bike. Heta niha ke çi kir, ku ji vir û ha çi bike? De beje. Ma bi dara li me nexistin? Hetanî ku qîrîna me giMşte ezmana? Li me xistin, ke çi kir? Li qereqolan heta bine linge meriyan tiş tîşîbûn, paşe, de beje. Paşe çûn ji axa lawa kirin, "Me kir, tu meke. Em bi qurban û xulame te bin, kûçike ber dere te bin.", gotin an na? Tu rabûyî çi dibejî niha?

Evana rastin, le bele dîsa jî dibejim ku gundî veya qebûl nakin.

Eva yeka, wekî ku meriv bi saxî çelkin. Kesî eva li düftiye jî nedîtiye.

Li mala xale Mihe, çend hevalen wîyen kevn rûniştibûn. Derd û ku len xwe ji hevre digotin. Jina wî çend şekiren qirej bîter kiribûn. Çay da wan. Bû şelpiniya deve wan, him çay vexwarin , him jî xeber dan.

Eme edî çi bikin? Hale me we çilobe?

Hale me we çi bibe, ma tu hal di mede maye? Hale kûçikan sed çare ji hale me çetire. Ez dixwazim herime bajer. Kured min wisa dixwazin.

"Eme bixebitin, li te biniherin", dibejin. Ya rastî hişe min ji xorten vî zemanî qet nabire. Le bele te çi bikî, meriv bi wan jî nikare.

Xale Mihe, kalemer, nikarîbû bi cîkîde here. Herdu jinen wî jî pîr bûn. Ji deste wî nedihat ku kar bike. Dixwest ku ew çend rojen wî yen mayi, tevî biraye xwe û zared wî derbas bike. Hertim guhdarî dikir û niha jî. Paşe ew jî kete nav xeberdana mevanen xwe.

Xwede bike, nepakî dernekeve, lexistin û hevdu kuştin. Çi te ji rûye perçek erd te.

Vedroked wan di mile \vande, çend jinen gund hatin ser kaniye.

Wanjî derde meren xwe di can û bedenen xwede his dikirin, bi hevre xeber didan.

Ax, ez bi qurbana zimane we me. Fata mihacir çi le kiriye? Wisa kiriye ku tiliya hemûyan di deve wande maye.

Bi ser axede qîriyaye, ode terk kiriye. Se mera nikaribûye we bigirin.
"Ew ciye ku neheqî le heye, ez li wira nasekinim", gotiye.
Vegeriyaye mera, bi ser wande qîriyaye: "Tû ji meraniya were!
Axa hûn gişt anîne hale jina. Li welate bave min, yekî awha bikira, ez dizanim çi dihate sere wî. Ka di wede ew xîret, ew dil?", gotiye.
Gelek tişten dine jî gotiye. "Ez erde xwe ji kesîre nanelim, heta nî traktör li ser meyte min derbas nebe." Paşe jî gotiye ku "Tu li bedengiya me nenihere, ev erdana gişt yed mene."
Jinen gund, sed gotin jî ji aliye xwede le zede dikirin û digotin. Bi gotina ter nedibûn. Paşe jîxwestin ku biçin cem Fate, ji deve we bibi nizin. Bi xwere ji zared Fatere çend gûz, hek an jî tiştekî dine dibirin.
24
Le Fate, bi du se gotinen kin û kurt qala we şeve dikir. Vedigeriya, desten jina digirt, wekî kesen zana digot:
Ji meren xwere bejin, mirin heye, le vegerîn tüne! Ev meriva edî zede çû. Bi erde xweve bizeliqin, dernekevin. Le eðer hûn van gotinen min bavejin paş guhe xwe, hûne li bajaran, li ciyen dine birçî û belengaz bimînin. Ya rastiye ji were bejim: namus û heya jî we ji deste we here! Hûne bibine wek tolaz û jinen tolaza.
Li ber dere Soro çend cîran rûniştibûn. Him xeber didan, him jî rû ye xwe kur dikirin. Gûzane wan ji tirpaneke kevn hatibû çekirine.
Ev mîrata rind kur nake. Hertim rûye min dibire.
Soro gazî jina xwe kir:
Ka hela makîna mine rüya bîne.
Cüeteke nû xiste makîne û direjî cîrane xwe kir.
Qet xeberek ji axe derneket. Le gundîjînizanin, we çi bikin. Beçarene.
Iro, sibe herg we dest pe bikin. Ku ewjî di wextede nebe, mirina meye.

Tu li gundiyen me nenihere. Nivî, lo welleh ji nivî zedetir jî razîne ku gund terk bikin herin bajer. Le bele, ji xinziriya xwe tiştekî ji nihade nabejin. Xwestinen Ûsiv axa jîxwe ji wanre bû mene. Ka ewgun diyen ku ve neheqiye ji wî bipirse?
Yekî dine tevî xeberdane bû.
Ez dibejim ku jin û zar, em hemû biçin cem qeymeqem, cem hu kumate. Em bejin ku hukumat de û bave meye, bira ji mera careke bi bine. Yek jî erzihaleke bi zexm û bi tesir bidine nivîsandine. Ma qet bexte ve hukumate tüne, çawa gundiyen xwe we bide perçiqandine? Be guman we çarekî ji mere bibîne, ma ne wiloye?
Ev gundiye gava dine ku bersîva wî dabû:
Lo bavo, ya te jî aqile? Te çawişe zer çi zû ji bîr kir. Ma ew ne hukumate? Tu mudire tapiye, ye qûzik nas nakî? Dost û birayen Ûsiv axa bûn. Xelqe gişt nedigot ku eva tişten ku tene sere me gişt bi des te wî bûn. Paşe bi mîlyonan pereve çû. Qumandar, qaymeqam, ew ki ne? Ma ehbaben Ûsiv axa nînin? Ve bihare li baxçe Ûsiv axa, yed ku bera xwarin û reqî vexwarin, ma ez û tu bûn? Çi zû ji bîra te çû? Ma la te neşewite.
Le bavo, tu jî bere me didî hevraza. Herdu sere dare jî bi gûye.
Em bi axe nikarin. Nivî gundiyan bi dile xwe dixwazin ji gund herin. Li jor, zilamen hukumate, ew jî piştivaniya axe dikin. Bi serde jî dive hûn Mirtezaye partiya nû jîji bîra xwe dernexin. Mere herî mezin eve. Gundiyen wîjî gund terk kirin, çûn. Di günde wîde, çend malen xula-
25
me wî tene man. Girî û qîrîna wan çû gîhişte ezmana, le piştî çend roja hate ji bîrkirine.
Xeberdan caran li ser karen gund, caran jî bi pirsen vik û vala di rej bû. Soro kem qise dikir. Gava ku qise dikir awha digot:

Yen diçin, bira herin. Piştî çuha wan yen mayî bira hevdu bigirin. We çaxe eze hale Ûsiv axa bibînim. Em gişt bi hevdu bigirin, bi bine yek. Eðer em nebine yek, roja diya meye ew roj. We di diya me nin. We me biperçîqînin, mînanî sere meran. Le em ku yek bin, we hînge tiştkî dine bibe.

Van rojan, li ber dîvvaran, li kûçan, li hemû malan xelq kom dibû, gişta ew mesele xeber didan. Ew gundiyen ku bere hevdu eşandibûn, niha nezî hev dibûn. Tehlûka mezin ew nezî hev kiribûn. Carna, behevîtî, beçaretî, barkirin û çûyin... Cama li ciye xwe mayin, çi dibe bira bibe, li hember sekinandin...

Yekîtiya gundiyan pel bi pel mezin dibû, herroj li ser hevgirtine di hate sekinîn. Roj bi vî teherî derbas dibûn. Gal galen di nav gundde edî beqiymet bûbûn.

"Le wekî necin, dîsa ruşwet, pere, heqe nobedariye, na çek û sîlah, na nizanim çi? Le, yekî benamûs lexe, min an jî küre min bikuje? We çi bibe hale me? Zevî, mal û milk we bi kerî çi ben? Le nabe ku li peş çeved min male min bixwin! Ya rastî min bikujin, ji ve çetire..." Wisa difikirî Ûsiv axa.

"Di van rojande çu bûyer pek nehatin. Heta niha bîna tiştekî derneket. Cima gelo? Diyare ku tehlûkeyek tuneye. Ma tiştek hebûya, he ta niha qet nedihate bihîstine? Mele fersendeke rind dabû min, niha ez dikarim dûr û direj bifikirim. Min pirsa xweya dawîn hela he negotiye. Ya rebî ya xwede, ji ku hatibû bîra mele? Na hinek zeviyan îsal ji gundiyan bistîne, na hikekî jî bibaxşîne wan! Gelo meleyen weha bi aqil qet hatine dine?" Gava Ûsiv axa weha difikirî, ji nişkeva qehirî, "Eðer mele ev riya nedîta, min pirsa xwe ya dawiye gotibû û qedandibû. Mine erde xwe bi sere xwe bajota. Mine perçakî duda ji gire pişta gund bida gundiyan, her tişt xilas dibû, diçû. Ew meleye duru poze

xwe nexe nava her tişte jî nabe. Ev çi qurebûna wî bû. Wexta ku qehwe vedixwar, çiqas jî ji xwe razî bû? Dixwest ku beje: "Te dît, min tu çawa ji tengasiye rizgar kirî." Bawerke, ew mele duru, li cem gundiyan jî awha dibeje: "We dî, min çawa axa nerm kir, min hûn parastin." Wilo, dûr û direj difikirî Ûsiv axa. Ji her tiştî hevî dikir, ji teyren ber fire jî. Xwe gelekî bi qewet û zexm his dikir. Gotinen wî hemû bi cî dihatin. Hinek ji gundiyan dixwazin ku gund terk bikin, yen dine jî we di

26

nav çend mehande bar bikin. Yed ku necin jî, we jera xulamtî bikirana. Ji bo kare mala, zevî û çayiran çend merivjere lazim bûn. We li ser hinekande biqîriya, we hinek bitirsande, hemû tişt we biketa re. Gazî nobedar kir, Ûsiv axa. Ew gotine wî yed we roje, we ji hemû malanre yek bi yek bihata gotine. Ke ku bixwasta, axa we erd li nezîkî gire Ziyarete bida wan. Le qasî ku axa dixwaze. Nikarîbû gelekî bide. Le çerandina pez û dewaran jî bi tevayî nedihate birrîne.

-VIIBi

belavbûna xebere, gundîji nûva hişyar bûn. Te digot ku wan qet tiştek nedizanîbûn. Gund çeliqî. Çend roj şunda barkirine dest pe kir. Qismek ji wan berbi günden çiye, diçûne cem meriven xwe. Berbi ew günden ku hela he traktör neketine. Ve çare jî cem axayen wan gun dan. Ku mal û erde merivan tunebe, hemû cî wek hevin. Dîsa jî xulamî, nîvbirçî, nîv zikterî.

Çendekji wan diçûne bajaran, bajaren nezîk. Kemji kes çûne Ede ne, Mersine, Oonyaye. Li wan dera kar dîtin, hesane digotin. Hemû tişten xwe bi erzanî fýrotin û çûn. Yed ku diçûne ciyen nezîk, xaniyen xwe yed nizm hildiweşandin, dared xwe bi xwere dibirin. Destxistina daran, him zehmete, him jî bihaye. Derî û şibaken xwe jî nedihîştin ji parra. Yed ku diçûne bajaren dûr, erzan, erzan her tişt fýrotine axe,

kirne heqe re. Roj tunebû, ku kesî çûyî nebe. Yed mayîn ber xwe diketin, melûl bûn. Te digot ku qey ew malen çûyî, ji bedena wan, ji ruhe wan perçek diqetand û bi xwere dibir. Bi yed mayînre, taqeta neçûyîne kem dibû, ya rastî qet nedima. Çend qîz, xwûşk, meten wan di nav yed çûyîde bûn. Ev merivtiya bi carekî dileriziya û winda dibû. Jinan bi dilbirîn hevdu hembez dikir. Zarokan be ku tiştekî fem bikin, ji gund diqetiyan. Yed çûyî, pirs didane yed mayîn ku li wan dera, ji wanre jî cî û kar bibinin. "Ku sere we kete tengasiye, nesekinin, werin, eme pariyen xwe bi hevre parvekin, bi biratî bijîn", digotin. Ew cîra nen bere, ku hevdu eşandibûn, niha sed çare poşman bûbûn. Desten hevdu digirtin, rûyen hevdu maçî dikirin û hevdu dibaxişandin. Ku ji vir ha li ba hevdu bana, tucara we dilen hev nedieşandin. Le edî feda tiştekî tunebû.

Tişten ku hatibûn sere tendurekiyan, li van gundan zû hate bihîstine. Gundiyen fegîr ku dibihîstin, gunehe wan bi tendurekiyan dihat. Xwedîgundan, "Ûsiv axa eva kara rind bire seri', digotin.

27

Axa bi yen çuyîre çend giliyen nerm kiribû. Dixwest nişan bide ku dile wî ji bona gundiyan dişewite. Ya rastî di dile xwede şa dibû. Her tişt gelekî hesa pek hatibû. Ji texmîna wî jî hesatir. Ewen ku digotin "em naçin", qet deng ji wan dernediket. "Hela lo, ez çiqas tirsiyame ji wan?" difýkiriya Ûsiv axa.

Gund edî dişibî xerabekî. Li pey cîranen çûyî bedeng dibû. Meriv, heyvvan, mal her diçû kem dibûn. Her tişt, her tişt... Hers, tengasiya dile gundiyan her zede dibû. Yekîtî, hevgirtin, ev fýkrana mînanîgiloke rîse hiriye her diçû mezin dibû. Le di wan rojande, di bedena axede rehetî û kefxweşiyek hebû. Şa dibû. Her sehet şabûna wî zede di bû. Le ev şabûna, pir dom nedikir. Tişten nepak, bexer dihatine bîra

wî. "Na, na... Nabe. Le wekîben û li min xin? Le ku necin? Le hatin û mala min şewitandin? Tişten ku ji desten van berazan, van bexiretan naye, tuneye. Bi salan li ber dere axe xwe xizmet dikin, zike xwe ter di kin, axa wan dipareze, paşe dizivirin û axe xwe dikujin. Ma gundiyen awha kemin? Dive firset nekeve deste wan. Çi nakin ku? "
Mele gund, carna li cem axe, carna jî li cem gundiyan bû. Li gor di le wan qise dikir. Valabûyîna gund bi vî awayîji bo mele ne baş bû. Le kes li gund nemaye, we çi bikira? We ji kera meletî bikira? Ma cin û periyan we li pey wî nimej bikirana. Le axe ji wîre bigota, here ji xwere gundekî din bibine û le meletiye bike? Be aqilî kiribû. Çilo ev tiştana nikarîbû bine bîra xwe? Ewqas aqil dida xelqe, le cima bixwe nefikirîbû? We niha çawa bijiya? Kî we fitre, zekat bide wî. Kî we di mirî û şahiyade qedir û qiymete wî bigire? Ma ne ew gundî bûn ku saya wande mele, bû mele. Edî tirsa birçîmayine ketibû dile wî.
Di van rojen dawîde, ji gund barkirin edî sekinîbû, hema hema kesekîbar nedikir. Çend malen li gund mayî çûn cem axe, erd je xwestin.
Erde xam û bi kevir. Axa, çend roj mühlet ji wan xwest, heta cîraned wan jî ben. Leji malek du malan peve kesî din nehat û çu erd nexwest. Yen ku çûn, çûn. Yen ku man, edî baş tedigehiştin ku belayen me zin hedî hedî nezî wan dibin. Niha, zedetir di malande diciviyan. Li ber dîwaran hevdu dîtin û xeberdan qediyabû edî. Li malan qala rojen hete dikirin. Li gund heftî û du mal mabûn. Herşev di çar penc malande kom dibûn. Çu çare nedidîtin û belav dibûn. Hi nek li mala Soro û hinek jî li mala Mîro û xale Mihe diciviyan.
Em l&rin, mala wî hurşînin. Herşev mala wî bidine ber gullan.
28
Em herin di zeviyande rûnin, xwe li ber traktöre direj bikin, bi ra li ser me derbasbe here zeviyan bajo. Bira me bikuje ku hukumat jî

quze diya wî mşanî wî bide.
Veya rind tekine hişe xwe. Ûsiv axa ku bikeve tengasiye, we gazî hinekan ji me bike û wan bixapîne. We çend qirûş pere an jî çend buhust erd bide wan. Bi alîkariya wan we bera me bide. Hemû kesen xurt, dewlemend awha dikin, qeweten yen li hemberîxwe perçe perçe dikin, ji hev dixin. Ma hûn dizanin, ewe ke hilbijerin? Yed ku bi du dulîne. Yen kuji qerare xwe vedigerin. Yed tirsonek. Eðer sibe pewîst be, dive em amede bin ku male xwe, cane xwe, hetanî bizina dawî, hetanî kulave bin ciye xwe jî bidin. Ye ku masiya digire, qûna wîjîşil di be. Paşe, eðer ku em pişta xwe nesperin hev, bi carekî nabe. Gava neheqiyek
li yekîji me be kirin, dive em nebejin "bi çî min ketiye". îro we be serî wî, sibe jî we be sere min. Eðer ku em weha nekin, we sterkan bi me bidine jimartine.
Eee, ev gişt rastin. Me hemûyan jî fem kir. Le niha eme çi bikin? Dema çandina zeviyan hatiye, dema hergen biharene.
Li van gundan, salekîde du caran herg dikirin. Hergen bihare payîze diçandin. Zeviyen ku ne li deste bin, nezîkî çiye bin, payîze herg dikirin û piştî berfrabûne diçandin. Payîza dine jî genime xwe hildidan. Hela bise biraye min, ecela te çiye? Ecelekirin befeydeye. Ma cima tu nizanîku kare ecele mala meriyan xirab dike. Her tişt di wexte xwede. Qîz ku bû xama, kur ku bû xort, dizewicin. Eðer ku wilo ne be, çu gû ji wan dernakeve. Hela bisekine, hela ka çi dibe. Paşe, dive meriv guh bide cîranen din jî. Hukumata me heye, serîkîjî lazime em li wan xin, bira li me xwedî derkevin. Eðer ku çu re nema, eme bi er de xwe bizeliqin û kesek jî nikare me je bike.
Di kombûna mala Sorode, xeberdane bi vî teherî dom dikir. Le, piraniya kalan li mala xale Mihe kom dibûn. Hertim di davviya xeberdanande,

"Xwede bike, xirabî dernekeve" digotin rîspiyen gund.
Lo bavo, tu merivekîbi aqilî, tu çi dibejî? Maji ve xirabtir çi he ye? Ji ve şûnve edî çi ma?
Ere, ere zanim tu çi dibejî. Tirsa min ewe ku xort rabin dînîtiyekî bikin. Yek rabe li Ûsiv axa xe. An jî axa hinek ji me gundiyan bide kuştine. Ez ji van tiştan ditirsim.
Mihe, tu her diçî kal dibî, ji mirine ditirsî. Merik nan û ava me biriye, gewriya me digivîşîne, dîsa jî tu dibejî, "Le wekî ez bimirim".
Li ser ve gotine hemû keniyan, xale Mihe jî keniya.
29
Lo, beîmanno! Cane we hemûyan ji ye min şîrîntire. Hûn ji min pirtir ji mirine ditirsin. Hûn tiştekî nabejin, le hûn siyasete dikin. Xeberdane kalan zede direj nekir. Yek duda di xewre diçûn. Berî ku şev dereng bibe rabûn belav bûn.
-VIIIÛsiv
axa di van rojande çû bajer, ku traktorekî peyda bike. Henveha we çend dosten xwe yen memur jî bidîta. Di rojen peşde çi dibû, çi nedibû.
Pelek şûnde, çend malbaten din gund terk kirin. Hinek ji cîranan ne tevî xeberdanan dibûn, ne jî nezîkî axe, kesî nedizanî ewe çi bikin. Dile wan taqet nedikir ku xwe bidin alîkî. We çi bikirana. Guhdariya gundiyan dikirin, heq didan wan. Bi cesaret, xîret li dij axe derketin jî nedikete sere wan. "Ke heta niha kariye zora axan bibe? Kîbi wan dikare? Em birçî û taziyen Xwede çawa bi axa dikarin? Eva barekî ge lekî girane", digotin di sere xwede.
Piraniya gundiyan qerar dan ku biçin bajer ji bona ku hale xwe ji qaymaqemre erz bikin. Herkesi we qasî taqeta xwe tevî mesrefa çûna bajer bibûna. Li ser nave gundiyan, se kes we biçûna. Hinekan digo

tin, se kes ne besin, bira penc bin, heta he jî zede bin. Di dawiyede li ser penc kesan qerar dan. Xale Mihe jî di nav wande bû, ji ber ku ge lek nasen wî hebûn li bajer. Di kared vvehade tecrubeyen wî zedetir bû.

Rojtira dine her penc bi siwarî bi re ketin. Yen ku hespen wan tunebûn, li hespen cîranan siwar bûbûn. Ji bo ku li bajer mesrefekî ze de nekin, xwarina xwejîxistibûn heqîwan. Xale Mihe, te digot qey xort bûye. Ew di ciwaniya xwede, siwarekî baş bû. Li wan deran, di dawet û dîlanande kesî nedikarî bi wîre hespa bibezîne. Dudu ji sivvaran, li pey hevalen xwe, di keleka hevde hespen xwe hedî hedî dajotin û bi hevre xeber didan.

Ax, wekî qaymeqam me baş guhdarî bike, vegere beje ku "Ma min xelqe xwe li erde dîtiye, hetanî ez sax bim, çu cara nahelim ku axa maxa li ser we zorbetiye bikin. Nesekinin, herin günde xwe, vegerin ser zevî û çayiren xwe". Ax, carekî awha beje, we çi xweş be. Guhen Ûsiv axa we çawa bikevin, te bibînî.

Welleh meriv nizane, te dît ku qaymeqamekîşîrhelale, wisa got, got. Ma naye bîra te ew qaymeqame sewazî. "Ez ne mîna kesen dine-

30

me, li cem min neheqî, ruşwet tüne", gotibû. Tevgerek dabû bajer û derdoran, qet nebeje. Paşe, çaven wan kor bibe, şikyat kirin, tenî tedan. Merik ji van deran qewtandin. Qet naye zanîne, te niherî ev qaymeqame nûjî wekîwî derket. Maqiran ketiye koka meran. Ewen gund terk kirine we çawa poşman bibin.

Bira poşman bibin, hin kesî tiştek negotiye, revîn çûn.

Çar seet derbas bibû. Edî daren bajer, mînara camiye xuya dikir. Avvayiya qerekole û qesra hukumate dibiriqiya. Siwaran hespen xwe lez kirin. Xale Mihe bedeng bû. Diyar bû ku westiyaye. Gîhan xana

pere bajer. Hespen xwe kişandin tewle û daketin sûke.
Sûk piçûk bû. Dikanen sûke yed yek qatî li herdu aliye kolana ba jer ya bi tene, rez kirîbûn. Li ber derî û penceren dikanan, leçek pist û tişten dine dardekirîbûn. Solen lastîkî di hundire sandoqen nîvvekirîde behna lastike belav dikirin. Teqe teqa tenekeciyan bû. Sobe, mi sin çedikirin. Di çayxanande denge peşekar û teqûreqa tawle, domîne tevlîhev dibû. Ew herdu aşxaneyen ku li bajer hebûn, tene du se cure xwarin çedikirin. Peşekared aşxanan, li ber derî, "keremkin, keremkin",
diqiriyan. Gundiyed ku hatibûn bajer ji dikanekî derdiketin, diketine dikaneke dine. Herkes bi kare xwere mijûl bû. Hatina tendu rekiyan bala çu kesî nekişandibû. Wan li herdu aliye xwe diniherîn û berbi dayira Memed Efendiye erzihalcî diçûn.
Selam aleykim.
Aleykim selam, keremkin, hûn bi xer hatine. Fermo, qasekî rûnin, eze niha li kare we jî biniherim.
Memed Efendîbi kare xwe mijûl bû.
Bele me çi got? "Binanaleyh vaki tecavüzün defini, ika edilen za rar ve ziyanin tespitini yüksek makaminizdan arz ve talep ederiz..."
Di hundurde jinek û se mer hebûn. Bi gotinen wan, li günde xwe ncheqî dîtine. Hinekan dest daye ser zeviyen wan. Navbere du zeviyande hinek erde xam hebûye, gotine ku di nav hudûde medeye û ajotine. Jinike di fýraqekede ji Memed Efendiye erzihalcîre rûn anîbû.
We du kîlo derketa. Memed Efendî qasik kiribû bin masa xwe ku tav lenexe û nehelîne.
Van bibin û bidin qaymeqem.
Xwede ji te razîbe Memed Efendî, Xwede zared te bihele.
Paşe ewe we bişîne cem qumandare cendirman. Li we dere ca

reke dîsa halen xwe ji wîre bejin. Eðer karekîwiyî zehmet tunebe, hûn jî jere hespa bibinin, piştî çend roja ewe be, erde we teslîmî we bike.
31
Eðer ku min ew berve evare li sûke dît, eze jî jere bejim. De ser seran, ser çavan.
Gundiyan deyne xwe je pirsin, Memed Efendî li rûye wan nediniherî, di şûşa pencerere li dûre diniherî.
Bîst pangnot. Ya rastî heqe ve erzihale deh pangnote, le min ji were bi usul, bi reza qanûn û van kiteban nivîsî. Lewra jî bû bîst pang not. Ev erzihal zûtire hükme xwe nişan didin. Deh pangnote we zede çûn, le ji bo we baştire.
Bele, \visane Memed Efendî. Xwede jin û zared te bibaxşîne.
Em çi bikin? Bira here ciye xwe bibîne, bira poze wî bişkene, beşe. We bişkene, bişkene. Qanûn pesîra merive neheq bernade, we sere wan jî bişkene. Hûn niha biçin, paşe werin satila xwe bigirin. Eze bişînim mal, bira vala kin.
Memed Efendî yekî pozmezin, pencî pencîpenc şaliye, pore wî vveşiyaye. Wexta ku li qanûna dinihere an jî dinivîse her tim berçavken wî li ber çaved wîne. Ew refen li pist wî, bi pirtûken qalind, reş û rengçilmisî tijine. Li ser masa wî daktîloyek sekiniye û li dor paş we kaxiz û dosya tevlîhevin. Bihneke ji cixara xwe dikişine û dide alîkî, paşe rezeke duda dinivîse, bihneke din dikişine.
Ev Memed Efendî bere memur bû, ewqas nexwendîbû. Li we de me, ke ku ew herfen nû bizaniya, tanîn û dikirin memur. Piştî ku Me med Efendî bû memur, wî derûdora xwe ji bîrve kir. Foterek dabû se re xwe û baston di destde, bûbû belakî xwede. Gelek ruşwet xwaribû û bi vî awayî dewlemend bûbû. Le bele, Memed Efendî terbûn nizanibûye.

Çaven wîhertim di pey ruşvveten mezin digeriyaye. Kes ya ras tî nizane, rojeke tevî ruşvveteke mezin bûye. Hukumate ew ji memûrtiye derxistiye û xistiye zîndane. Le ewîjîrişwet daye hakim, savvciyan û piştî demeke kin ji zîndane derketiye. Ewî cezake ewqas kin xwaribû ku, piştî zîndane, dikaribû vegere ser kare xweye bere. Wî di dema girtîgehede erzihal nivîsiye, qeraren dadgehan xwendiye û bi vî teherî ewî xwe ferî huqûqe kiriye. Piştî ku ji girtîgehe derdikeve, dibîne ku di vî karîde gelek pere heye, dest ji memûrtiya xwe berdide û dibe erzihalcî.

Ew henveha di daweyen huqûqede vvekîliye jî dike.

Hûn bi xer hatin, Memed Efendî göte tendurekiyan û efa xwe ji wan xwest, biborin, hûn gelekî li heviya min man, ez çi bikim, kare me ewhaye.

Heşa, ew jî kare, Memed Efendî, xale Mihe got.

Xwede silametiye bide, fermo derde xwe bejin.

32

Mîro û Soro li cem hev rûniştibûn. Gava dine, wexta ku ferqa erzihalen li qanûnan niherî nivîsandin û yen ku ji ber xwe nivîsandî bihîstin, hevvekîbe kefbûn û li hevdu niherîn. Di nav vvande ye herîbi emir, xale Mihe, di serîde dest bi axaftine kir. "Bele, ha bele", digot û li rû ye xale Mihe diniherî, Memed efendî. Bere Memed efendî baş guhdarî dikir, dît ku xale Mihe gelekî direj kir, guh neda û bi qelama di deste xwede mijûl bû.

Bele, di deste wede tapî hene?

Na, bege min, tapiya çi? Ma tapî li cem ke heye li günde me,?

Tene em ji bav û kalen xwe dizanin ku ev der erde meye, me çandiye, me çiniye. Tapiya kesî jî tuneye. Ma tapiya Ûsiv axa heye?

Başe, sûreten tespîtan? Tarîx û numren wan? Ma ew jî tunin?

Na, tespîta çi? Qet tiştek jî tüne. We male ke tespît bikin. Erd erde meye.
Bele, zanim zanim. Tapiya erde nebe jî, dive tespîta wî hebe, qet nebe. Hukumat li gor we bace distîne. Be wan qet, qet nabe.
Giştan li rûye hevdu niherîn, çilo bûye ku ev tişt nizanibûne?
Dibe ku Ûsiv axa baca wan erdan dabe û hûn nizanibin?
We çaxe Soro kete nava pirsen wan.
Bere, di dema ew mudire tapiye ye qûzikde, axa hin kaxiz bi gun diyan û bi bave min jî da mor kirine. Wan tiliyen xwe li kaxizan xistin.
Le em nizanin ku ew kaxiz çi bûn?
Ewjî nebû. De bisekinin, wexta ku we bi axere li ser erde şer kir, gava hukumat û cendirme hatin û ev erd teslîmî axe kirin, ma we qet kaxiz mor kir? We tiliyen xwe bi kaxizeve da an neda?
Bele qurban, me tiliye xwe bi kaxizeve da. Ma me nekira, dibû?
Memed Efendî eniya xwe xurand. Ya rastî, ew ji hemû bûyeran agehdar bû. Di wan rojande, gelek kesan li bajer qala vî karî dikirin. icar, ma dibe ku yekî mînanî Memed Efendiye erzihalcî, yekî hişyar û guhbel qet nebihîze? Ûsiv axa çendekî bere, li ser piyan, hinekî qala vî karî kiribû.
Niha di deste wede, kaxiz û qeyden ku nişan bidin ku ev erd ye weye, qet tiştek tunene. Tapî tüne, tespît tüne. Meqbûzen bace tüne. Tüne û tüne. Dimîne tiştek; zîliyeta vî erde, ku ye weye. Vî qerarîjî te ne dadgeh didin. Ji bo ve yeke zehmetî û pere hewceye. Eðer hûn bixwazin,
pere we jî hebe, ez dikarim ji nihade dawe vekim.
Çiqas diçe ez qurban, Memed Efendî?
Mehkeme mesref dixweze. Hetanî dawiya mehkeme, ji bo ku hûn vî erdî bikaribin bajon û biçînin, pevvîste ku meriv bi emaneti hi-

nek pere bide hukumate. Qerare mîqtare van peran jî dîsa mehkeme dide. Dibe ku zede bixwazin. Ji bo dawe eze penc hezarî bixwazim.
We direj bike. Kar û xebat dixwaze.
Gişta, li ser gotina Memed Efendî di hundire xwede ofînîke kûr kişandin. Hineken nû ketin hundir. Tegehiştin ku xeberdan naye direjkirine.
Memed Efendî we ji wanre ji ber kiteben qanûnan du erzi hal binivîsanda, ew jî we erzihalek bidana qaymeqem, we ye din jî bişandana Enqere, seroke hukumatere.
Mîro û Sor li hev niherîn.
Bele. Bira wisa be. Çi dixwaze, eme bikin. Tu ji me baştir diza nî.
Niha, hela di serîde, kar nedihate xirabkirine. Her tişt we tevlîhev bûbûya.
Memed Efendî berçavken xwe dida ber çaven xwe û paşe derdixist û cixare dikişand. Bi teqe teq li daktîloye dixist. Ji hemûyanre çay dabû anîne. Erzihal nivîsî û ji wanre xwend. Ya rastî wan qet tiştek jî je fem nekirin. Tene, "Erd ye bav û kalen meye, niha we çi bikirana, deste xwe direjî hukumata xwe dikirin", ev deran fem kirin. Pûl lemis tin û îmze kirin. Ye ku nedikarî îmze bike, tiliya xwe ya deste çepe boyax dikir û bi kaxizeve dida. We yek bidana qaymaqem, ya dine jî we bişandana Enqere. Gerek ji bîr nekirana ku meqbûza şandine ji postaxane bistandana. Memed Efendî ji ber kiteben qanûnan nivîsîbû, lewra jî heqe Memed Efendî çil pangnot bû. Le ew bi sî û penc pangnota razîbû. Tendurekiyan peren xwe dan û derketin.
Wexta ku çûne qonaxa hukumate, li ber dere qaymeqem cendirmekî nobed digirt.

Bira, yen di hundirde derkevin, dûre hûne biçin cem qaymeqem, got cendirme ji tendurekiyanre.
Li ber derî sekinîn, piştî çend deqîqan dora wan jî hatibû. Şewqe xwe dane deste xwe, hedî hedî, bi tirs li derîxistin û piştî ku denge qaymeqem,
"gîr", bihîstin, ketin hundir. Qaymeqam, yekî ne xort û ne jî kal bû. Kincen wî gcwr, renge genimî li rûye wî bû. Li dîware pist wî qumaşekî sor dardekirîbû, navînede şiklekî Mistefa Kemalî mezin he bû.
Li ser masa wî, kaxiz, kiteb, qelem û tişten dine tijî bûn. Qaymaqcm sere xwe bilind nekir, bi tiştekî mijûl bû. Soro hedîka kuxiya, "em ha tin", dixwast beje. Qaymaqem qet tiştek nepirsî û erzihal ji deste xale Mihe vvergirt. Xwend. We li ser erzihale tiştek binivîsiya, zivirî ji wan pirsî.
34
Tapiyen we li cem wene?
Na bege min. Tapiyen kesî jî tunene.
Qeyden, tespîten kevn li kune?
Ewjî tunene, bege min. Günde me ji berede awhaye, be tapî û be tespite. Le, herkes xwediye erde xwene.
Çawa dibe, çawa dibe? Günde be tapî û be tespît çilo dibe? Em li ku dijîn?
Soro bi dengekî nizm:
Le bege min, ye ku erd ji deste me digire, Ûsiv axa, ewjî be tapî û be tespite.
Tiştekî wisa nabe. Günden be tapî û be tespît nabe. Bele, eze ni ha we bişînim oda hana li rex me, ewe her tişte pek bînin û we serwext bikin.

Qaymeqem gazî cendirme li ber deriye kir, cendirme hat, silav da.
Vana bibe cem katib.
Paşe jî li tendurekiyan vegeriya:
Dûre hûne biçin cem qumandare cendirman. Fermo, herin.
Li binetara erzilahale, "Ji Qeleme û Qumandare cendirmanre", nivîsîbû qaymeqem û îmze kiribû. Tendurekiyan silav dan û derketin.
Katib yekî porgewr, pore wîjî kurt bû. Bere çawişe cendirman bû ye. Erzihala wan girt, li deftereke qalin qeyit kir. Paşe jî ew şandine daîra qumandare cendirman. Piştî ku tendurekiyan çûn cem qumandare cendirman jî, fer bûn ku rojekî katib û qumandare cendirman we bene gund û li ser vî karî bisekinin.
Edî evar bû. Hemû memur ji kar derdiketin. Tendurekiyan jî kare xwe qedandibûn û we vegeriyana günde xwe. Di rede rastî Ehmed Efendî hatin. Ehmed Efendî di daîra bacede kar dikir. Jina wîji xisime tendurekiyan bû. Ehmed Efendî bûyeren ku hatibû sere ten- durekiyan bihîstibû. Ûsiv axa ji Ehmed Efendî qet hez nedikir. Ehmed Efendî silav da tendurekiyan û ew dane sekinandine, hale wan pirsî.
A rastî dile wî ji bo tendurekiyan dişevvitî. Di kûçede li ser piyan xeberdan ne baş bû, meriv nedikarî dûr û direj xeber bide.
Kerem kin, em herin mal, ve evare çayekî vexwin, bîna xwe hildin.
Em pismamen hev ten.
Gundiyan dixwast ku zede wext winda nekin, riya wan direj bû. Le ji çaven Ehmed Efendî fem kirin ku ewe hinek tiştan ji tendurekiyanre beje.
Hatin mala Ehmed Efendî. Jina Ehmed Efendî hal û wexte xisimen xwe pirsî û çayeke bi dem ji wanre hazir kir. Ehmed Efendî dixwast
35
hinek tiştan bi wan bide fem kirin. Levvra jî bi desten xwe ji wanre di

got ku baş guhdarî bikin.
Li cem we tapî û qeyden tespîtan tüne. Yen Ûsiv axa jî tünen.
Le ew mudire tapiyeyî qûzik, ew tespîten li ser bav û kalen we qet nedane ber çavan û serde jî aqil daye Ûsiv axa. Ûsiv axa baca erde, li ser nave xwe daye hukumate. Ya rastî bi tespîten kevn, ev erda ye bav û kalen weye, le baca wan Ûsiv axa daye. icar, bac çiqas bûye? Qet! Penc an jî deh pangnot. Paşe jî kaxiz dane morkirine, îmzekirine ku ev erd bi kire daye we. Meriv wan kaxizan mor bike, paşe jî vveha dibe.
Way, way. Way be namus, way.
Le bavo, eme ji ku bizanin bi van tiştan, evana nayen bîra şey tân. Way, kûçikbavan, way. Çawa jî li hev anîne.
Hemû memûren mezin naxwazin ku li derûdora wan tişten ne xweş bibin. Dbcebitin û dixwazin ku hemû tişten bûyî bira be deng be, dûre wan ne rehet neke. Ji bo veya jî qaymeqam j i şer û giliyan hez nake, naxweze. Yen ji vvîbilindtir jîhene. Weji qaymaqemre nebejin ku "Te cima nikarîbû ev kara bi reve bibira?" Hûn cendiraman jî dizanin, ew jî naxwazin ku sere wan beşe, le rişweta xwe jî ji bîr nakin. Ji ber van tiştan kare we gelekî zehmete. Memed Efendiye erzihalcî rast di beje. Mehkeme dikare van tiştan safî bike. Le bele ewîjîji bo kare xwe rast gotiye. Ne doste weye. Di vîkarîde pere heye. Pere dixweze, abûkat dixweze. wext dixweze ev kara. Dawen weha ewqas zû naqedin, salan dixwazin, kî dizane çend salan. Ev Memed Efendî merivekî be îtibare. Ûsiv axa piçekî berîka wî germ bike, we seete we we bifroşe. Herin, dûr û direj bifikirin. Bersivekî ji minre bişînin. Meyen daîra min, werin male. Ez dixwazim dişteki din jî ji were bejim, min bihîst ku Ûsiv axa li vvîlayete diðere ku traktoreke kire bike. Li pey maraşî, melatyayiyan diðere. De hûn li ser sere min û li ser çave min hatin, ri ya we dûre. Rewiyanre sekinandin ne başe.

Ehmed Efendî mevanen xwe rewî kir.
-IX^
Ûsiv axa hate bajer, serî da çend dosten xwe. Qedereke bere gun diyen wî hatibûn, gelo çi kiribûn? Erzihale wan çilo gehiştibû qu- man dara cendirman. Ew gişt yeko yek hîn bû. Serîk da Memed Efendî jî. Pere xeber da û henek kir. Di navxeberdana xwede, eşkere kir ku haya wîji erzihalan heye. Gerek bi xwe biçûya vvîlayete, ji bo kirekiri-
36
na traktöre. Bi deste xwe dive vî karî bibe serî. Berî ku biçe vvîlayete, xwest ku Murtazaye seroke partiya nû jî bibîne. Ewîgelekî dostî nişan da bû. Bi germî, ya rastî jî dostî, awha dibe. Herdu di mile hevde çûbûn gelek daîre û ciyan. Bira hemû qiymete Ûsiv axa bizanibin, bira ji bere zedetir hurmeta Ûsiv axa bigirin, alîkariya wî bikin.
Murtaza çend roj bere ji çûyina xwe vvîlayete ji Ûsiv axare behs kir. Ji meriven xwere gotibû, ku Ûsiv axa jî merive wane. Eðer karekî wî li vvîlayete hebe, dikaribû be minet, be tirs here cem vvan, alîkariye ji vvan bbcvvaze.
Dîtina maraşiyan û meletiyan gelekî hesan bû li vvîlayete. Ew gele kî devvlemend bûn jî. Eðer te bixwesta, te dikarî traktorekî ji vvan ki re bikî, an jî erde bidî vvan, ewji tere herg bikin, bireşînin, biçînin. Paşe we nivî bi nivî parve dikir. Ew hemû giredayî lihevhatine bûn.
Ûsiv axa li vvîlayete bihîst ku xwedî traktoran li Yildiz Hotele diman. Ewjî çû vvir û ji xwere odek girt. Ji katibe hotele pirsî, xwest ku yekî durust ji vvan nas bike. Katibe hotele nave Okeşe maraşîjere got. Bere li salaona hotele, paşe jî di oda Okeşde rûniştin. Bi Okeşre soh bet kirin û xeberdan pir xweş bû. Evvî gelekî dîtibû û derbaskiribû. Hersal dihate van aliyan, bi nivî karî erd dajot û diçinî. Tene ji çend dosten xwere bi kire dida. Axan hedî hedî traktör û makîneyen ku bi

xwe xwe diçine dikirîn. Okeş piştî çend salan edî erde vvan axana nedajot. Le bi gelekî hesanî erden nû didît. Carna naz dikir û nedixwest erden nû bigire. Li van aliyan jî mînanî ciyen dine bi qayide û bi rez ev karana dimeşiyan. Di oda Okeşde her tişt xeber dan.
Xelq çavva dikin, em jî wisa bikin. Zevî ji te, toxim ji me herduyan. Nivî ji te, nivî ji min. Eme makîna çinîne bi hevre tivdarek bikin. Traktör û ajotina erde jimin. Kişandina genim û fýrotina wî jî nivî ni vî. Di davvîde ye mayî eme di nav xwede nivîbi nivî par\e bikin. Bele, zaf rinde. Xelq çavva dike, em jî vvilo bikin. Te bibînî, eme gelekî baş bi hevre kar bikin.
Le me tiştek ji bîr kir, tişteherîgirîngjîeve. Li gund dive em xirabiyekînebînin.
Em xerîbin, ji der hatine. Dive kesî din tu doze ji ze viyan neke. Bira derd û bela neye sere me. Çend caran tişte vveha li me qewimîn. Qezenca me li alikî, me makîne û cane xwe jî bi zore xilas kir. Deve min careke şevvitye bavo. Ez ji bo karen vveha tuneme.
Okeş qaseke sekinî, paşe pede çû:
Eme ji dil li kare xwe xwedî derkevin. Min gelek xwedî erd dîtine, ku tiştek nedane me. Rikefî me kirine. Eme qewle xwe li cem no-
37
tere bikin. Kî ji pirsa xwe vegere, dive bîst û penc hezaran bide ye di ne. Başe? Eðer tu qebûl dikî, eme bi careke dest bi kare xwe bikin. Bira, qet tirseke te tunebe. Erd ye mine. Gund ji bav û kale min maye. Dubendî û gilî di günde minde tuneye. Heqe te xwarin! Heşa, heşa. Ev ne kare miroviye. Eme, vvek me behs kir, qewle xwe çekin û zûtire dest pe bikin.
Ûsiv axa, bi xwe betir dixwest ku qewl li cem notere bibe, nedixwast ku sibe an dusibe yekî cahil û nezan tiştekî beje û xwediye traktöre jî

bihele û bireve.
Li cem noter qewl çekirin. Kare Ûsiv axa li vvîlayete qediya, divabû ku vegere bajer ji bo hinek karen xwe yen mayîn. Hervveha Okeş vve piştî çend rojan bihata bajer, cem Ûsiv axa. We biçûyana gund. Tendurekî nive şeve gîhane gund. Rojtira din, evare di çend malan de civiyan. Çûna xwe bajer, yek bi yek, çi kirine, çavva erzihal dane qaymaqem û yek jîji Enqerere şandine, hemû ji serî heta davvî ji cîra nen xwere gotin. Van gotinan tu hevî neda gundiyan. Zanibûn ku ti ştek ji vî karî dernaye. Le şerm û fedî dikirin ku ve yeke eşkere bejin. Zanibûn ku axa çûye ji bo ku traktorekî peyda bike an jî şîrikekî bibi ne ku zeviyan bi hevre bajon. Ve yeke tesîreke mezin li ser gundiyan kiribû. Di çöken vvande derman nehiştibû. Axe gotinen xwe di davviyede bi cî dianî. Dibe ku di nava çend rojande her tişt biqede.
Meriv ku heviyen xwe vvinda bike, çi dimîne? Hevî, ji dayik bûne. Kesen bi hevî, dinyayen nû ava dikin. Hevî, quwete. Per û baske, he vî. Meriv te ser xwe, mejûye wî baş dişuxile, dile wî fýreh û sivik dibe. Dine çiqas xweş û geş dibe. Rojen zilaman, kesk, gevez û bi rengîn di be. Çiye, çavvane, naye zanîn, le xirabî û nepakî naye bîra mcrivan. Gişt, pakî, delalî, rindî û zelalî ten fikre jin û meran. Merxasî te, quvvet û serbilindî te.
Dixwazin ku neheqiye di bin lingen xwede pepez bikin. Le bele ca reke jî, te evv hevî, bavverî vvinda kir, dest û milen te ten şikestine, çö ken tede derman namîne, zimane te di deve tede nagere. Tu jî fem nakî ku tu çi dibejî. Her tişt li ber çeven te reş dibe. Merivan û dine hez nakî. Meriven be hevî, edî bi kesî bavverî nake. Ina nake ku yekî dine vve başiya wî bbcvvaze. Xwarina wî jî be tame, mînanî jahreye.
38
Niha gundî di vî halîde bûn. Bebavverî, behevîtî mînanî mirine bi

ser vvande girtibû. Mînanî hevva mij û duman, li sere çiyan, di zivistanande.
Hestiyen vvan, te digo vala bûne. Wer ku meriv di xewede di
ðere.
Soro, Mîro û yek du gundiyen dine dizanîbûn, ku li bajer tu döş
ten vvan tunin. Peren vvan tunene ku ruşvvet bidin. Her tişten vvan umûd û heviyen vvan bûn. Xwe bikine yek, bi erde xweve bizeliqin. Li hemberîaxe
bisekinin. Xen ji ve reye, re nedidîtin. Wisaxuya dikir, re di
çû û dihat ser ve reye.
Wan, fikren xwe ji hevalen xwere jî digotin. Hinekan wisa femdikirin
ku we kesen din ben û di devvsa vvande van karana bikin. Qet nedifikirîn
ku dive ev kara bi deste vvan bibe. Xale Mihe û çenden dine,
hişkî û hing nedbcvvastin. Bi dîtina vvan, evven civvan nizanin ku li ber
deren hukumate rezîl û risvva bûyîn çiye. Ji çend malan yek du birîndar,
mirî derketin çiye. Gullek be li eniya merivan bikeve, kes li cem
kesî namîne. icar, meriv tekeve hepisan, jin û zar birçî û tazî... Di nav
çar dîvvarande meriv dirize, le dîsa jî kes kesî napirse. Mejûye van xortan
li sere kîre vvane. Ji ku bizanibin we çi be sere vvan. Paşe kî vve nepakiye
paqij bike, ve yeke nizanin. Birîdarbûn û mirin di davviya van
karande heye. Ev tiştana dihanîne bîra xwe, nedixwestin alîkariya So
ro û Mîro bikin. Le çi heye, axe hemû gundî belengaz kiriye, Soro vvan
jî ne neheqin. Nedbcvvastin ku ji gundiyen xwe biqetin, le nikaribûn ku
bi vvanre bin jî.
Soro û Mîro, piştî ku xeber belav bû ku axa traktöre tîne, diçûn malen
cîranan û mala xale Mihe. Hal û kef dipirsiyan, dipeyiviyan, ku çi
bikin, bikin, le yekbin. Deh tilî bi hevre bişuxilin, bixebitin, tişten baş
çedikin. Ji bo veya gerek yek bin. Bi hevre serî hildin û li hember axe

bisekinin.
"Erde me namusa meye, cane meye, him jî xwîna meye. Yeke ku damare wî ye xwîne be birîne, ma dikarin bijîn? Na, najîn. Bo veya, ji bo jiyane gerek em bi erde xweve bizeliqin. Bira sere me jekin. Le be le em sere xwe wisa bi erzanîjî nadin. Cima evv natirsin, hertim em ditirsin?
Ma em ewqasî jî pîsin? Ma cane me ewqasî jî ezîze? Me sere xwe mînanî mirîşkan berjer kiriye. Ji bo hembezek giha, ji bo hekeke em hevdu dbcvvin, le ji bo erde xwe dest û piyen me giredayiye. Me pir çiye xwe kiriye û em rûniştine."
Edî di kombûnande xeberdanen vveha dihate kirine. Guhartine xwe nişan dida. Gişta jî digot, ku bi tevayî herin, di zeviyen xwede rûnin,
39
cot bikin û li hemberî traktöre bisekinin. Bera xwediye traktöre bidin û ji gund biqewtînin.
Hedî, hedî tesîra Soro û Mîro û hevalen vvan li ser gundiyan xurtir dibû. Hemû cîran dihatin bi vvan dişevvriyan. Wan jî her car digotin, yekbin, bela belayî mebin, be yekîtî qet tiştek nabe. Fate berede qerara xwe dabû. Te digot ku wexta ji diya xwe bûye, qerare xwe daye. We bimiriya le erde xwe nedida tu kesî. Carna, wexta ku tene dima, xwe bi xwe re digot: "Evv erda cima ewqas şîrine? Cima çaven van kesan ji erde ter nabe, vve di davviyede nekevine bine erde?" Fikre avvha kin û kurt dihatin hişe vve û diçûn. Paşe tişten nû dihatin bîra vve. "Ewqas erde axe heye, evv ter nabe, cima eze ter bibim? Ma evv jî vve nekeve bine erde? Bi serde jî ewqas peren vvî, mal û milken wî hene. Le çî min heye? Ev zevî ku nebin, eze van etîman bi çi mezin bikim? Na, na. Mi rin heye, le erd dayîn tüne. Eðer ez buhustek erde xwe jî bidim, ez ne keça wî bavîme."

Bave vve jî qet evv nepirsiyabû, bira nepirse, çi dibe bira bibe. Car na lavva dikir, carna gazin dikir ji meriven dora xwe. Dbcvvest ku evv li erde xwe xwedî derkevin. Li ber jinan digeriya û digot, "Alî meren xwe bikin". Digot ku "Nekevine paşila mere ku nikare zeviyen xwe bipareze. Tekevin paşila kûçikan, çetire. Xwûşken min, avvha nebe, eme pe rişan bibin".

Gundî niha di nav xwede yek bûn. Yen be taqet denge xwe dernedixistin. Fedî dikirin ku tiştekî bejin. Evv jî mînanî pez tevî kerî diçûn niha. Helka, hetanî kînge, hetanî kedere?

Çend rojan şûnde, sibeke şiyar bûn, çi bibînin, traktoreke mezin, remorkek li paşiye giredayî ber bi zeviyen li pere gund diçû. Erde li vvî alî, bi piranîye gundiyen ku gund terk kiribûn, bû. Hinek ji wî erdî jî, ye gundiyen ku li gund mabûn, bû. Di pist zeviyande çemek nîvmezin derbas dibû.

Traktör gîha ser zeviyan. Evare hatibûn. Ji traktöre peya bûn. Li cem Okeş, xwediye traktöre yekî navmilfire, bi simele qalin, qemer he bû. Şofer Weysel bû evv. Li tenişta vvîjî, Xidir disekinî, vve alikariya Weysel bikira. Evv herdu jî ji aliye Albistane, gundî bûn. Ji bo ku cîhe xwe ye razane, cîhe xwerinçekirin û bîhn hildane, berbi çem çûn û ji xwere cîhek tespît kirin. '

Weysel ji zûva li cem Okeş dixebitî. Roj û şev, tav û baran nedigot, kardikir. Demen ku nexweşbûya jî dest ji dîreksiyone bernedida. Er den sor û reş dajot, tevî hev dikir. We waxte kefxweş dibû. Te digot, dine ser û binîdike. Ku zevî jî be kevirbin... Zike wî terbe... Ji mal xe-

40

beren xweş girtibe... Çeven wî tiştekî nabîne; dajot û dajot. Xidir jî mî na wî elevî bû. Ev du sal bûn ku alîkariya wî dikir. Her perçen moto

ra, mînanî tişten zarokan ye lîstike zanibû Weysel. Qet xwe şûnva nedikişand,
timayî nedikir. Her tişt bi Xidir nişan dida, hîn dikir. Waxta
ku Xidir divvestiya, mînanî biraye xwe le miqate dibû.
Du traktoren Okeş dine hebûn. Li cîne din dişuxilîn. Karen vvan ku
xilas dibûn, diçûne alîkî dine. Biraye wî û küre wî li ber vvan traktoran
bûn. Okeş ji Weysel, Weysel jî ji Okeş gelekî dibcvveş bûn. Le Weysel
hertim meraq dikir, ku ev jiyana vve kînge xilas bibe? We kînge tevîjin
û zaren xwe kevçîk girar bbcvvin? Ax, karekî wî hebûya! Karekî ku her
tim le bbcebitiya. Hine erde wî hebûya. An jî erebeka xiloxarî û şikestî
hebûya. Le bira ya wî bi xwe biya. We şev, roj negota, bi dest û diranen
xwe kar bikira, jiyaneka baş bijiya. Ne diçû ber deste xelqe. Okeş
baş bû. Le ev qireja. Ev xerîbiya. Meriv nizane ku vve kînge kuta bibe.
Bira xwarina wî kevçîk tene biya, le bi xwe sere xwe biya. Bira li mala
xwe, cem jin û zaren xwe biya. Evana ku dihatine bîra vvî. çaven wî li
dûr meze dikir, kûr kûr cixare dikişand. "Cima ez tene ketime derde
cane xwe", digot û dest bi kilamen Pîr Siltan Evdal dikir.
Kesek ji gundiyan nehatibû û xerhatin nedabûne vvan. Hela he kes
ne dîtibûn. Xenji xulamen Ûsiv axa, rastî kesekî gundî nehatibûn.
Gund di bedengiyede bû. Gundekî avvha bedeng çilo dibe? Okeş axa
jî kete şike. Ji hevdû pirsiyan, paşe:
Lo. Lo çi mere... Dibe ku nivînen xwene germ û paşilen jinen
xwe hezdikin. Mînanî me,ji mal, jin, zaren xwe aciz nebûne. Tema de
ven xwe zanin. Keniyan.
Okeş, vve kar texista reze û piştî du roja biçûya. Car cara bo niherandina
Rewşa kar pevîstba, vve bihata. Rûn û mazot vve li bajer bikiriyana.
Gava çend varîlen mezin bistandana, gelekî dikişand û tere di
kir.

Ev kare xwe heta nîvro kuta kirin. Ciye xwarin, raketin û tişten wane din, hazir bû niha. Okeş û Ûsiv axa bi hevre xeber didan ku we ji kedere dest pe bikin? We çend roja bikşîne? Bi deste xwe çend cî nişan didan. Hatin cem yen dine. Weysel ji vvanre:
Her tişt hazir bûn. Hûn bixwazin, ez dikarim niha dest pe bikim.
Ji ku dest pe bikin em? Giştî bi hevre bajom? Di nav zeviyande bira erd nemîne, bi serda pe bajom? An jî tekim du û se qeta? Hezdikin, ve dere hetanî nezîkiya ave, tevayî tekime zevîke mezin. Paşe, ev ku xilas bû, ciyen li dor ave bajom. Bere bere, nezîkî ave jî bibim. Mere
41
jî pevvîste. Dûr nekevin em. Car cara ku em vvestiyan, eme tekevine ave. Bi toz û xuliye meriv dbcure paşe.
Li nezîkî zevî û çayiran çend zeviyen gundiyen ku hela he li gund bûn, hebûn. "Hela niha zeviyen van gundiyen ku çûne, ben ajotine, da ha rinde, bira ev der xilas bibin, paşe dora vanen dinene", di dile xwede derbazkir Ûsiv axa. Levvra, gotinen Weysel gelekî di cîde dît.
Bele, raste. Bele. Him avvha he jîqenc dibe. Paşe ev kar ye teye.
Tu ji me baştir zanî. Li çaven Okeş niherî. Evvî jîbi mena "bele", sere xwe hejand.
Evana hetanî ku ev kar kirine reze, li gund jî jiyan dest pe kiribû.
Ref bi ref hemû diçûne zevî û karen xwe. Desten vvande şiv, dar, li peşiyen vvan çend heyvvan, ser milen hinekan tirmix, mer û tişten din hebûn. Çendek ji vvan li ber Ûsiv axa vvanre derbaz bûn. Qet nezivirîn û ne jî li vvane nû hatî niherîn. Ruyen vvan bi qerar û pirçî, te digot ku dbcvvazin li hinekan xin. Hemû vve biçûyana zeviyen xwe, bi tiştekî kar bikirana. Traktör ku be, bbcvvaze erde vvan bajo, vve li hember bisekinîna.
Bere peşîn bihatana zeviya ke, qet ferq nedikir. Çaven gişta, we

li ser hevdû buya. Hemû wc bi hevre bihatana. Ajotina traktöre bida na sekinanadine. We li ber traktöre nelipitîna. Le li kesî jî nedbdstin û rikem nedikirin. Wexta ku ye dine nesekinîna, an jî tiştek bi gundi yan bikirana, evana jî vve bersiv bidana. Axa, küre vvî, ewqas meriven vvî tu vve bi dest û mile xwe giredayî bisekinîna. Cima vve çepik lexistana? Na xer.

Weysel hetanî evare, li ser traktöre bû. Ajot. Li nav herdu seriyan çû û hat. Ev makîna terikî poze xwe kir bû nava erde, be bîhn, hema usa peşde diçû. Reşayiya erden ku hate ajotine, her diçû zede û fireh dibû. Bere ewqas erd, çend malan bi çend rojan nikaribû bi cot bajotana. Him jîbi bihusteke kûrayî. Ve makîne nedigot ku ez birçîme an jî tîme. Her tişt li ser vvestandin û birçîbûna şofer bû. Bixwasta, dikaribû şev jî heta sibe bajota. Weysel wisa ne dikir. Bihna xvv hildida evaran. Paşe dîsa demeke dajot û traktör dihanî ciye razane. Li peş ça ven xwe dûr nedixist. Sibe zû radibû, dîsa dest pe dikir. Bereve avvha hîn bûbû, avvha dikir.

Gundiyan femkirin ku îro zeviyen vvan nehatine ajotine, şev jî tiştek nabe. Hetanî evare li zeviyen xwe mijûl bûn. Paşe hedî hedî riya gund girtin.

Ûsiv axa û Okeş hatibûne mal. Şîv xwarin, sohbet kirin. Okeş vvestiyabû, xwast ku raze. Car cara pişta wî dieşiya. Ye pirî, kînge divvestiya an jî piştî revvîtiye dihat ev eşa. Hedî hedî dest pe dikir niha. Ûsiv

42

axa mevane xwe xewrakir. Gazî nobedar kir, bi dengekî nizm je re got ku bira hin bibe, "li gund çi dibe? Erden vvan ku be ajotine gelo tiştek bibe an na?" "Kî çi difikirî?"

Welle axe min, gundî bekefe. Bi min jî bavver nakin. Dibejin ku ez merive teme. Pirsen xwe ji min vedişerin. Dîsa jî qet baş nabînim

tevvren vvan. Dibe ku tiştekî bikin. Qet li malen xwe nasekinin. Kom dibin, hema usa xeber didin. Dibejin ku, xwazila axa avvha nekira. Avvha nekira. îca deste xwe li pişta vvan bida? Van tolazan.
Hinek qet napeyivin. Le bele, li deven yen dine dinherin.
Yen ku nepakiye denrin kîne, Şukrî?
Nobedar kir ku navekî duda beje. Paşe vegeriya. Gerek avvha neki ra. Ne rast bû. Cîranen baş bûn. Yek jî, cima neheq bûn? Le vvakî paşe hîn bibin û xerabîke binine sere vvî? We çi biba?
Walle axe min, kesekî ku xerabiye derxe naxuyaye. Navan niza nim. Le min hale gund ji tere got. Ez tekevim güne ke? Nizanim.
Ûsiv axa fem kir ku nobedar hine tiştan zane. Le dile wî naxwaze, an jî ditirse. Levvra tiştekî nabeje.
Eso çi dibeje? Esoye Silo?
Evv napeyive. Kem te û diçe ba cîranan. Li ber xwe dikeve. Bedenge axa. Min ve evare jî dît.
Le Hesen. Hesene Hemzo?
Ewjîwisaaxa.
Niha here, vvan herda bibîne. Gazî bike. Bira kes te nebîne. Be deng û ker, here malen vvan. Li cem jinen vvan jî nebeje. Bikşîne li alîkî, jere beje. Bira bene vira. Wan herda hilde, bîne vira. We hersekanre çend gotinen min hene.
Piştî nîv seheteke, herse hilda li odeka xewle.
Guh bidine min. We herseka jî hez dikim. Bere jî, ji cîranen vve yen dine zedetir, min hûn nezîkî xwe didît, alîkariya vve dikir. Ne wiloye? Dinede her tişt li hemberî heve. Hûn bi minre çavvabin, ez jî bi vvere vvilo dibim. Ji vve hersekare û çendeken dinre, ku ez pe bi bavverim,
eze erde vve ji vvere bihelim. Hûne li cem min bimînin. Hûn guh

nedine yen dine. Çi vvere ji vvan? Hemû kes, gerek tivdareken sere xwe bi desten xwe bikin. Bere bi xwe, bere cane xwe, paşe yen dine. Ne wisane?
Nezîkî vvan rûnişti bû. Nizm dipeyivî ku kesekî dine nebihîse. Dixvvast ku bavveriye bide vvan.
43
Bira kes nizanibe ku eze zevî û erde bidime vve. Paşe ne baş di
be. We bejin axa dubendiye dike nava gund. Gişta yek nagire. We xerabiye
vve bikin. Pirsa namus û meran didime vve. Le, hûne çi bikin?
Em çi zanin axa. Çavva emir dikî, eme jî wisa bikin. Hesen li
Eso niherî û got.
Eso yekî reş, direj, mînanî istûneke bû. Ruye vviye reş di nav pirçede, betir reş dbcuya. Tiştek ne digot. Ker û bedeng bû. Meriva zanibû
ku bi dile.
Nobedar Şukrî, di dile xwede digot, "bo me, her diçe vve baş bibe."
Nîvşabûn hatibû ser. Axe vvî, davviyede bi çavekî dine li wî meze kiri
bû.
Hune ji nihade tekevine nav gund. Bira kes nizanibe ku hûn hatine
vira û me xeberdaye. Qet bira ji tiştekî şik nekin. Xeberdan û pirsan bînin û bejin ku "em neheqin, erd ye axeye." An jî bejin, "em badilhevva disekinin, em herin, derden bene sere me." Bi dostî qise bi
kin. Him jî bizanibin ku ya rastî eve. Evv fem nakin. Gotinen vve dibe ku vvan hişyar bike. Le serwaxt bin. Eðer evv bizanibin, ku hûn vana bi ya min dibejin, we waxte vve li bere zedetir har bibin. Kes edî li ruye vve nanihere. Paşe... Bele paşe ez jî nikarim vve li gund xwayî bikim. Rind hîn bibin ku li gund çi dibe? Kî aqil dide vvan? Dixwazin ku çi bikin? Mînanî rûviyan bi felbin. Ji rûviyan jî zedetir. Bedengbin. Mî

nanî ava kûr bedengbin. Kes bira şik û şipe neke. Hûn ku tişten xeter dibihîsîn, bira haya min je hebe. De niha ez vve bibînim. Yek, yek ji mal derkevin. Bira kes vve nebîne.
Gundî vvekî hemû evaran, kom bûn, dipeyiviyan. Soro, Mîroşandibû maleke dine, cem cîranan. We, wext bi wext bihatana ba hev. We cînen dine, malen cîranande tevî xeberdane bibûna. Li ser yekitiya gund bixebitîna. We tirsa gundiyan bişkenandina. We bûyer ji hevdûre bigotana.
Soro li mala cîranekî, li ser rojen peş xeber dida.
Em herin traktöre bişevvitînin. Gulla berdine, digot xortekî. So
ro li aliye wî zivirî û:
Wisa ecele ncke bira. Em ne dijmine male kesîne. Em kesî ta
lan jî nakin. Axa ku bela xwe di me nede, rikefî me neke, em deste xwc
ranakin. Em cima neheqbin? Bira evv nehcqbe. Bira bere evv be rike
fî me bike. Ecele nekin. Karen ecele, xwarina bi tem jîbetem dike. Bi
hemde xwe bisekinin. Her tişt bi hemd.
Hesene Hemzo kete hundir. Silav da. Çû li alîkî rûnişt. Ev çend roj
û şev bûn ku xeberdan dibûn, kom dibûn. Hesen li cem vvan nediseki-
44
nî. gundiyan digot ku vve îro an jî sibeh here, terka gund bike. Ve şeve
ev çiye? Him jî hertişt tevî hev dibin, bîhna karen ne baş ten. Hesen
te nava vvan.
Nav peyvande, gundiyan got ku çend roja şunda, dor dihate ajotina
zeviyen vvan. Gotinen xwene hertim nû dikirin. Yen biçûna li zevi
yan rûniştana. Jin û zaren xvve jî bibiranana. "Em nanelin, hûn erde
me bajon," bigotana. Tiştekî din nedikirin. Tene ne diniştin ku erden
vvan be ajotine. Ku aliye dine li vvan xista, an jî tiştek bikira, gundî jî
vve li hember derketana. We şiv, sing, tişten avvha hildana desten xwe.

We baqil, bi hemd, be qîre qîr buna.
Çek kar hanîn, kare vvan nîn bû niha. Çi dibe, çi nabe. Le vvekî axa berî vvan li vvan xe? Jin û zar ne gotî, gulla berî vvanda? Bû, bû. Yen avvha kirî, cima kemin li van deran? Evv peyv, bi vî tehrî direj dibûn û diçûn. Hesen:
Way cîranno! Ev.çi kare? Le vvekî lexe, yekî ji me bikuje? Le ye kîji me bikuje? Anjî cendirme û hukumat ben me qir bikin. Tobe, to be.
Yek j i cîranan:
Lo Hesen, tu çi dibejî? Merik ava me biriye, bi saxî saxî, li ber çavan, me dike göre. Tu çi dibejî? We bikuje jî, bira bikuje.
Evv xorte gava dine, xwe ne girt:
Heta eme bimrin, bira evv bimre. Heta diya me digrî, bira diya vvî bigrî. Ev çiye Hesen? Dile te tijî tirs bûye lo.
Hesen fedî kir. Careke te vvalya bû, dest pe kiribû. Xwe şûnva kişan din nedibû. Gotinen Ûsiv axa hatine bîre.
Ez. Tu min zanî. Ez natirsim. Ez dikarim deve wî jî bidirînim.
Le bele hukumat, cendirme li alî vvîne. Yeke jî qanûn erde dide vvî. Nade me. Li peş qanûne heqe vviye. Hela he bersiva eý zihalen me jî nedane. Gotinen inin eve ku bi vvîre serederî zehmete. Xenji veya tirsa min tüne.
Hinekan bersiv dane, li hember derketin. Ji axere dane xebera. Pirsen nepak gotin. Neheqiya ku evv dike gotin. Eme qir kin, jekin, nizam çi bikin. Hinekan, yen ku şikeda bûn, du dil bûn, xeber nedan. Guhdarî kirin. Soro fem kir ku tiştek heye. Di nav kom û xeberdanen şev û rojande tunebû. Paşe, ve şeve hat û avvha qise kir. Küre kere xwe da bû dest, bi hostatî xeber nedabû. Soro zanîbû, ev çiye. Ev pirs ne yen vvî bi xwe bûn. Hela tu deve küre kere binhere. "Ye deve axe bidirîne...

Le em çi bikin, heq ye axcye..." Evana hînî Hesen kiribûn. Wisa difikirî Soro.

45

Nedbcvvast ku bi Hesen tekeve şike. Be deng, be hes... Gerek meriv hînbibûya ku hela ka çi bûye? Çiye hîme vî karî? Axa vve pişta hine kan miz bide. Çend pirsen şîrîn beje, paşe di nav vvande, dubendiye dest pe bike. Ye ku ji her tiştî betir meriya ditirsîne, evaye. Ye ku gün deki rezîl bike evaye. Ye ku biran bi hevdû bide qirkirine, ye ku yekitiye perçe perçe dike eve. Careke, toxime dubendiye bira cîh negire.

Paşe xera vve dere tüne edî.

Hemûyan denge xwe birîbûn, kesî nedbcvvast bipeyive. Hesen:

Min şaş fem nekin. Eze bi vvere heta mirine herim. Yen ku hate bîra min, min gotin. Hûn çi dibejin, ez jî bi vvere. Nizanim vve çilo bi be? Hişe min hilnade.

Paşe destura xwe xwest û çû. Yen mayî li hevdû niherîn. Giştan bi niherandinen xwe, dixwastin ku hine tiştan ji hevdûre bibejin. Le be le, kesî eşkere tiştek ne got.

Soro:

Her tişte eşkere bibe niha. Hela bisekinin.

Hine tişten dine jî dbcvvast ku beje. Le ne got. Dereng bû edî. Gişt belabûn, çûn.

Soro diçû mala xvve. Dît ku li mala cîranekî, işq xuya dike. Nezîkî vvir bû. Deng dihat. Berve wî yalî çû. Deng bi hers û bilind bûn. Li de riye male xist. Vekirin. Kete hundir. Soro dîtin û xeberdana xwe nebirîn. Him dipeyivîn, him jî silava wî hildidan. Mîro jî li vvira bû. Nîvc şeve, ev xeberdanen bi hers û direj... Tiştekî bi xer nîn bû. Dumana cixare hundir vvilo kiribû ku meriv difetisiya. Dîtin ku Soro bi meraq li dora xwe meze dike, ji wî re jî gotin.

Eso dibeje ku xwastinen me gişt jî rastin, bi cîne. Le vvekî huku mat beje ku li hemberî axa derketin sûce? Eva, li dij hukumate serhildane, vve me hemûyan bavejine hepse. Paşe vve çavva bibe? Kiye me xilas bike? Ke dîtiye ku meriv sere bi axanre dibe serî. Yeka din jî, ma ev erd ye axe nîne? Bele, bere ye me bûne, le em le ne bûne xwayî. Ye ku keda xwe nexwe, yekî dine ji dest digre û dbcvve. Ev kirinen me paşe zerare nedine me? Soro edî be şik kete şiphe. Eso jî bere kem dihat. Işev hatiye. Deve wî û ye Hesen mînanî hevin. Ev çi kare? Him jî roja ku traktör hat dest bi ajotina erde kir. Şik kete dile vvî. Qet ne peyivî. Tiştek di nav vî karîde hebû. Gelo çi bû?

Soro, Mîro bi hevre ode terk kirin. Sika xwe ji hevdure gotin. Ge rek meriv bi van herd cîranan nexape. Li pey kirinen vvan bisekine. Paşe vve çi be kirine, vve di nav xweda qerar bidana. Niha her tişt di nav herduyada bû. Li ser gotina Ûsiv axa, avvha kirina vvan, Eso û He-

46

sen, eşkere ku bibe, yen dîsa xeber bidana cîranan. Tirs, xof ne hevvcebû.!

-XIRojtira

dine Soro gelekî li ser sekinî, le bele tu re nedît. Ji kesîre jî negot ku vve çi bikira. Te digot ku hinek jere dibejin, "bişekine, sebir bike, te hîn bibî hertiştî." ...Hate bîra Soro ku şev û tarî gelek tişten xirab, nepakiye vedişere.

Soro li paş baxçe Ûsiv axa diçû. Aveke piçûk heye li vvira. Paşe hevraz çû, berve nevvala teng û direje li aliye günde Kanîspiye diçe. Ji gün de vvan, tu kesî evv ne dîtibû. Kera wî tene li ser wî bû. Tarî ket, hedî hedîşûnva zivirî. Serejer dihat. Kete nav daren baxçe axe. Bedeng di çû. Li mala axe, di oda mezinde lüks vediket. Penceren male li baxçe dinherîn. Oedereke li male, penceran meze kir. Bîhn jîhilnedida. Bîhna

vvî diçikiya car cara. Hinek çûn û hatin male. Evvî gişt jî naskirin. Bûk, jin û küre vviyî mezin bûn. Xulamen wî jî hebûn. Sekinî. Sekinandina vvî gelekî kişand, dile wî teng bû. Sebra wî nema edî. Tirsara, cixare jî nedikişand. Ji dîtina vvan ditirsiya. Nikaribû şevereşede kibrite vexe. Be tedbîri ne rind bû. Karekî şaş, piçûkbe jî, her tiştî ser û binî dike. Kes nedikete male, dernediket niha. Çend hevv di odede runiştîbûn. Pencere ji bejna wî bilintir bû. Levvra yen li ser piya tene dikarîbû bidîta. Xulam li ser karen xwe bûn, an jî razabûn. Li ber derî reşayiya du merivan ber çaven wî ket. Li ber işqa şimake, evv li ber derî ferq kirin, le bele nas nekir ku evv kîne. Du gav peşde avet. Deste xwe dabû ser dîvvare sûre. Hundire male meze kir. Ciye xwe guhart ku rind bibîne. Xwe bîr kir, dikaribûn wî bibînin. Çaven wî li şi.naqe û li ode bûn. Niherî. Reşatiyen li ber derî ketibûne male. Ye peşîn, ji şewqe vvî nas kir; Şükriye nobedar bû. Rind nedihate jibartine. Ode ji wî gelekî dûr bû. Şewqen mînanî ye Şukrî li gund tunebûn. Levvra evva baş nas kir. Ye li cem vvî, yekî direj û zirav bû. Gelo kî bû? Mînanî Esoye Silo dihate xuyane. Merî nikaribû beje, îlla evve. Ax, xwazila evva jî nas bi kira. Bele evva Eso bû. Le çilo bikira ku evva rind bidîta, qerar bida. Axa jî li ser piya bû. Hersek bi hevre xeber didan. Hereketen dest û milen vvan nişan dida ku tişten girîng dipeyîvîn. Yek dîsa kete hundir. Çavva li berderîbaş neniherîbû, ye nû, rind nedîtibû. Heyf... Ev, ji ma le an yekî din bû? Ciye xwe dîsa guhart. Sere xwe direj kir, rind nihe rî. Niherî, le kes nas nekir. Ye nû hatî xeber nedida. Soro kete şike ku
47
evvî napeyive, dibe Hesene Hemzobe? Di hişe xwede bir û hani. Ji vir nikaribû vvan nasbike. Ciye xwe guhartin, nezîk buna şimake nerast bû, baş nîn bû. Evvî nû hatîjî niha qise dikir. Te digot ku axa xeber dide, yen din bersiv didin. Yek qise dike û paşe ye dine. Rûneniştin. Me

riv zanibû ku vve zû herin. Soro kere ker şûnve çû. Dûr ket, li ser sü rere banzda. Ser riya li biniya gund, dîsa li mala axe meze kir. Ev de ra baş bû. Le nikaribû ku kesekî nas bike. Qet nedibû. Evv kesen ku ji mala axe derketin, bidîta dikaribû berve vvan, li ale gund here. Firset bidîta, di nava gundde rastî vvan bihata, vve nas bikira. Bi çaven xwe, we vvan bidîta. Evv xeberdane îşev hatine bîra vvî. Be şik, evv peyîv gişt, yek bi yek ji axere hatine gotine. Ewxorte dînik jî, ji ku got, "em lexin, em axe bikujin." Hine cîranan gotibû ku "em şiv û daren xwe hildine cem xwe." Ji ku ev gotin gotibûn? Kertî kiribûn. Ji vir ha gerek meriv gelekî hişyar û li ser xwebe. Pirseke ne di cîde dikaribû seren hemû yan texe belaye. Ve deme pir tişt hatine bîra vvî. We çi çare bidîtana? Çaven wî hema usa li derî bûn. Derî vebû, yek derket. Tene bû. Ber ve gund diçû. Soro hedîka kete nav gund. Dbcvvast ku be peşiya vvî. Xwe li ber dîvvare maleke teland. Heviya dengen piya sekinî. Di tariyede guh rind dibihen. Denge piyen wî nezîk dibûn. Hinekî din jî nezik bûn. Soro xwe bi dîvver ve zeliqand. Denge piyan gelekî nezîkî vvî bûn. Ji deste wî bihata, vve bîhn jî nestanda. Niha he rind dijbart, ye hatî. Çaven wî hînî tariye bûn, baş ferq dikirin. Li peşiya vvîre derbas bû. Bele ev Eso bû. Rind texmîn kiribû. "Way be nams. Way bije heram. Kûçike küre kûçikan. Qet meriv gundiyen xwe difroşe? Lavvo, di ve dinede pûştîji te tenere ma?" got di dile xwede.

Denge gaven wî edî dûr ketibûn, ne dihatine bihîstine. Soro ji ciye xwe derket. Nexwest li pey Eso here. Levvra li aliye dine berjer çû. He la he çend gav nehavetibû ku Hesen rastî wî hat. Hesene Hemzove, niha sîng bi sîng li hember hev bûn. Herdû jîşaş bûn nişkeva. Soro He sen texmîn kiribû, le bele dîsa jî veciniqî. Zimane Hesen hate giredane. Dile wî le bû bisekine. Soro xwe zû berev kir.

Oxirbe Hesen.

Tere jî, e vvalle, e vvalle.
Denge Soro nas kiribû. Li peş hevdû bûn. Dile Hesen dikûta. Xwcde kir ku şeva reş bû, kesî nedidît. Çilmisîbû, di tariyede kesî 1er- zandina vvî ferq nekir.
Golika mine piçûk li derve maye, le diðerim. Tu ji ku teyî, got Soro.
48
Hesen he zede şaş bû. We çi bigota? Ji ku dihat? We çavva bigota? Xeberdanen gundiyan, axaftinen cîrananen dizî, hatibû û ji axere go tibû. We çavva bigota? Zimane wî ne geriya. Tiştek ji dev dernediket. Cemidî di ciye xwede.
E...z. Eeee. Ji jere teme. Jere.
Soro rind te denrist ku lerizandina denge vvî, nişkeva bi şaşî bebersîv sekinandina vvî, nişan dida ku evv jî ji mala axe te. Yen ku bi axere dipeyivîn, ev herdu bûn. Soro her tişt fem kir. Ewqas besi wî bû.
Ez hevvekî dîsa, mîrata golike bigerim got û serejer çû.
Paşe zivirî male. Mîro li male hivya wî disekinî. Iro qet hevdû ne dîtibûn. Yen bûyî hemû ji Mîrore got.
Duh ewqas tolazî dikirin... Tu nabejî hemû ji bo veya bûye. Ax be namûsno, ax. Ax qehpeno, ax. Bira deyne hustiye vvebe.
Xeberdanen duh gişt gîhandine axe. Niha eme çavva gevezetiye, peyiven becî bidine sekinandine? Van, niha bi hezaran jî dane ser û vvisa ji axere gotin. Kî çi zane hela he çi gotine? Yen ne bûyî, yen ne gotî. Keniya, xeberdana xwe nebirrî.
Di alîkîde jî baş dibe. Qet nebe we bitirse. Le vvekî here cem cen dirme qumandarî, beje, ku "even li hemberî hûkûmate sere xwe hildin, çek û tivdareken xwe dikin!" Hema yek qala serhildane bike, cen dirme hazirin vve deqîqe. Hertim di ve bavveriyedene. Nabejin ku lo

evana cima li hemberî hûkûmate bisekinin. We vî karî bi çi bikin? Ci ma, ewqasî be aqilin gelo? Qet avvha dibe? We sehete dikevin şike, îna dikin. Kî bbcvvaze, şiltaxeke baveje yen dine. Besî her tiştiye. He tanî ku evv xwe xilas bike, vve nebûyî jî te sere vvî.
Bira ben, me binherin. Li cem ke çi heye ? Ji bav û kalan mayî, qirmek, dude şikestî zedetir çi heye? Le bele dîsa jî gere em gelekî serwextbin, şasiye nekin.
Vî buyera Hesen û Eso, ji kesîre nebeje. Xenjî evven ku li zima ne xwe xwayîne. Dibe ku gele tişten betem bibin.
Ya rastî tiştekî ku meriv bike tüne. Gotina min eve, hertişt eşkereye. Eme bi erde xweve bizeliqin, nelipitin. Firseteke bibinin, bi xwaye traktorere, anjîbi şoferre xeber bidin. Bira bihelin û herin. Ku xwaye traktöre be re, Ûsiv axa jî ye qebûl bike. Razî bibe. Traktör kirîn ne wisa hesaye. Wisa zûtire nabe. Levvra gere em ve traktöre nedine şuxilandine.
Oro, tu çi dibejî? Em qet nikaribin tiştekî jî bikin, nikarin traktöre jî bişevvitînin?
49
-XIIErzihala
ku dabûne qaymeqam, li hivya cendirme qumandrî û nivîsdare qaymeqam bû, ku herine Tendureke. Karen vvanî dine hebû, levvra neçûbûn û dereng mabûn. Herduka jî, qet neçûyî her tişt zani bûn. Le neçûyî jî nedibû. Ye bibûna gilî û xeberdanen li ser zimane xelqe. Hînî tişten avvha bibûn. Her roj li gundekî kare avvha dibihîstin. Ye biçûna, herd alî jî guhdarî bikirina. Tapî û qeyden vvan bidîtana. Eðer ku kare vvan buya, ye raporek ji qaymeqamre binivîsîna. Tiştekî ecelekirine jî hebûya, ye li we dere bihanîna cî. Na, eðer ku kare meh keme buya, ye ji herdû aliyanre jî li ruye vvan bigotana. Dîsa ye rapor

bidana qaymeqam. Evvîjî, ye him ji Ûsiv axare, him ji gundiyanre qerar bişanda.
Gundî hîn bûn ku cendirme qumandarîû nivîsdar hatine mala Ûsiv axa û banî yen kû erzihal dane dikin. Mbctare gund Qasime xwarziye Ûsiv axa bû. Le bele mora mbrter û yen ezayen vvî, hemû di berîka Ûsiv axade bûn. Her tişt di deste vvîde bûn.
Evv penc kesen ku erzihal dabûn, bi ser gazîkirina cendirman çûne mala axe. Ji cîranen xwere jî gotin ku bira evv jî bene, guhdarî bikin. Ûsiv axa bi kef bû. Evv gundiyen ku li hemberî vvîne, giliyen wî dikin, ye bihatana cem vvî, yen li ruyen hev bisekinîna. Di davviyede hertişt vve eşkerebiya. Evv gişt ye li ser qûna xwe rûniştana. Bira hîn bibûna ku axa şîkatkirin çiye?
Rojeka xweş bû. Rojen payizen, be evvr û zelal. Li ber derî kulav û carcîm rexistine. Li ser vvan doşegen qalind, balgiyen mezin. Mevanan çaya xwe wexwaribûn. Rehetiyen xwe dinherîn. Li cem vvan jî se cen dirme û tivingen vvan di destande bûn. Herî jer rûniştibûn.
Li peşiya qumandar û nivîskar, kaxiz û erzihala ku gundiyan dabû, disekinîn. Axa li tenişta vvan rûniştîbû. Bo navroja mevanan emir di da meriven xwe. Nivîsdar sere xwe bilind kir, li gundiyan niherî. Li je re cî nîşanî vvan da, ku bira rûnin.
Rûnin. Rûnin li vve jere.
Te digot ku xwayî male evve, wisa rehet, aza ferman dida. Sere giştan li ber vvande bûn. Xale Mihe di tehrekî poşmaniyede. Şewqe vvî mînanî hertim li alîkî ketiye. Çaven xwe ji Ûsiv axa direvand, ne dixvvast ku li wî binhere. Yen dine hedîkan rûniştin. Soro, li nav vvande ye herî serbest bû. Xerhatinî da qumandar û nivîsdar. Ûsiv axa silav kir. Mevanan bi nîv dil silava wî vegerandin. Ûsiv axa û xale Mihe, ni-
50

zanim çavva bû, li çaven hev niherîn. "Tu jî Mihe?" digot, niherandinen axe. Mihe bekef bû. Ev karen ha ji ku hatibûne sere vvî? Bi vî em re xwe, çi derde wî hebû di nav vvande?
Nivîsdar kaxiz tevdidan.
We erzihal daye. Ûsiv axa li berî me dide. Me ji gund derdbce.
Erde meji desten me diçe. We avvha gotiye, şîkat kiriye. Ev çiye? Hûn çi dibejin?
Hemûyan li Soro niherîn. Tu xeberde digotin.
Bele, qumandar û bege min. Zeviyen gund heta niha di deste me gundiyande bûn, me dajot. Ûsiv axa ana traktorek haniye û dbcvvaze ku me ji gund derxe. Ev erd ye me hemûyane. Ye hukumateye, ye xezîneye
û ye ermeniyen ku ji gund çûne. Hinek jî ye bav û kalen mene, berî me ajotine. Eva zilme ku mere te kirine, perçiqandina meye. Şîkate me eve.
Ev ciyen ku hûn dibejin, ye mene, tapiyen vvan ji minre bînin. Ka bidine min.
Bege min, di vî gundîde tapiyen kesî tüne. Tapiyen me tunin, le ye Ûsiv axa jî tunin. Qey tapî nedane vî gundî. Be tapîne gişt.
Çavva nedane? Tişten avvha dibe qet?
Ez çi zanim? Zanebûna me eve, ku tapiyen kesî tunin.
Le vvisane. Ka qeyden "tespîtan" bînin. Qe nebe, vvan bînin.
Cima, evv jî tunin?
Na xer. Cem me evv jî tunin. Em dizanin ku ev der, erde meye, em dajon. Tu kesî ev ji me nepirsîn heta niha. Ji Ûsiv axa jî ne pirsin. Jivvîjî.
Tu Ûsiv axa li wî alî bihele. Ne tapiyen vve hene, ne jî qeyden "tespîtan". Eme ji ku bizanibin ku ev zevî û merg yen vvene? Binhere

biraye min, hûn şîkat dikin. Memûren hukumate karen xwe dihelin te ne vira. Tene ber lingen vve. Paşe desten vvede qet tiştek jî tüne. Avv ha nabe. Nabe avvha. Paşe zivirî li ale Ûsiv axa.
Tu çi dibejî Ûsiv axa?
Ûsiv axa leçegeke sipî vekir, gelek kaxiz j e derxistin. Yek, bi yek da ne. Nivîsdar jî hedî hedî li kaxizan niherî. Dbcvvand û ji hevdû dbdst. Kaxiznen kevn, kenaren vvan kem û diryayî bûn. Çendek ji vvan veqetand, da cem xwe.
Binhere, li vira... Meqbûze beşan, va li vira hene. Beşen vvan Ûsiv axa daye. Evv cima beşen erde vve bide? Ka vve digot ku ev der be "tes pihin. Qet beşen erde be tespît dibe?
51
Walle em nizanin, çavva bûye?
Le bele, hûn zanin şîkat bikin. Cima van nizanin? Le binhere, bere hatine, ev der teslîmî Ûsiv axa kirine. Hine gundiyan mor kiriye, tüyen xwe lexistine. Binhere, binhere. Dîsa hine kaxiz hene ku nişan didin, vvî, ev erd bi icar daye vve.
Em nizanin. Me mor nekiriye. Kî çi zane? Dibe, hinek xapandine, dane morkirine.
Nivîsdar ruye xwe tirş kir, bi dengekî bilind:
Kuro tu dînî? Kî bi zore dikare tiştekî bide kirine? Bide morki rine? Navnîşan kirine? Kî dikare ke bbcapîne? De vvere ve dere mor bike, dibejim, te qebûl bikî? Ere? Te qebûl bikî?
Gundiyan dît ku her diçe, halen vvan xirab dibe. Cîranen din jî hatibûn nezîkî vvan. Cendirman careke duda evv şûnva şandin, le paşe hedî, hedî dîsa peşde hatin.
Waxta ev erd ye vvebûn, vve cima bi peçiyan mor kiriye ku Ûsiv axa bi îcar daye vve, qumandar pirsî.

Soro û yen dine niha li aliye wî zivirîn.
Me mor nekiriye. Em nizanin.
Ve çare nivîsdar tevîbû.
Em bejin ku vvisane. Cima hûn keda xwe, ceh û genimen xwe bi Ûsiv axare parve dikin? Waxta ye vveye, cima pareke didine vvî? De ji minre bejin. Cima didine vvî?
Bereva didine. Em jî wisa hîn bûne. Didine.
Hema vvilo? Be sebeb? Cima nabin nadine yekî dine? Hersal di dine Ûsiv axa.
Ev gotin direj bûn. Hine tişt nivîsîn. Paşe qumandar û nivîsdar ka re xwe xilas kirin.
Niha, bi qencî, bi başîbijîn. Hûn cîranin. Heqe vve tüne li ser van erdan. Le, na, hûn dibejin ku heqe meye, vve çaxe hûne herin mehke me. Careke jî li vve dere li heqe xwe bigerin. Nerehetî naxwazim. Li vî gundî tiştek bibe... Bele tiştek bibe...
Zivirî li Soro û çar gundiyen dine niherî.
Eze her tiştî ji vve bizanim. Paşe hûn zanin. Li gund şer û pevçûyine naxwazim.
Xale Mihe:
Bege min. Efendiye min. Bi van salen xwe, eze levî çi karî bibim? Hûne ji me bipirsin. Em feqîrin... Gunene. Me şîkat kir û çûne huku mate, cima ev sûce? Ez tevî tiştekî nînim. Tevî qct tu tiştî.
Soro sere xwe bilind kir.
52
Bege min. Em çûne cem qanûne. Me şîkate xwe kir. Ya rastî gundî giştîjî vve bikira. Gotin ku niha hûn bikin. Em meze bikin çi di be, paşe jî eme bikin. Meriv her tiştî bi lingen xweve darda dike. Em li hemberî qanûne dernakevin, le bele cima gund gişt, ji me bepirsîne?

Kîgura ke dike ku hûn ji me bipirsin? Ez bi xwe vve gotina vve qebûl nakim. Va gundî, hemû li ve derene. Hûn bi xwe jere bejin.
Mîro jî:
Ez jîqebûl nakim.
Ezjî...
Nivîsdar zivirî. Gundiyan dora wî girtibûn.
Li gund, betemiye naxwazim. Hûn zanin li hemberî qanûne derketin çiye. Cezaye we çiye. Paşe hûn zanin, ha.
Ji her alîkî, dengek dihat niha.
Eðer axa xerawiyen neke, ne pakî ji me naye, got hinekan.
Çendekan pişta xwe ledan, berve gund çûn. Didane xebera. Cen dirman evv hemû dûrxistin. Gundî çûne nava gund. Mevan ji bo seleqeliye
vegeriyane ode.
-XIIIEv
çend roj bûn ku Okeş axa şûnve çûbû. Dile Weysel qet nedbcvvast ku bbcebite. Ji roja peşîn zanibû ku bi xwere nerehetî, nepakî ha nine vî gundî. Wexta di peşiya vvanre derbaz dibûn, kes nedikeniya, kesî li ruye vvan nedinherî. Caran, zare piçûk bi meraq dihatin, meze dikirin. Ji vvan zedetir kes nedihat. Çend xort di peş vvanre çûbûn, le beşera vvan qet ne baş bûn. "Meriv qet silavaka xwede jî nade mevanen ku nû hatine günde vvan?"
Paşe her tişt fem kir. Ji xulamen axe pirsî. Zimane vvan, edeten vvan rind zanibû. Çi ferqa Albistane ji van deran hebû? Her tişt hîn bû û ber xwe ket. Bi dil nexastî, dibûne sebeben derde xelqe. Ev ne baş bû. Ji bav kalen xwe cima hindikî guhdarî kiribû, bihîstibû... Hindik şîret kiribûn li ser neheqiye? Zaren helekane jî zanibûn çîroka Pîr Siltan. Dadaloxlî, Saltiqe Pîr. Gişt jî li hemberî neheqiye derneketi bûn? Çi

kare wî li vira hebû? Hate van deran, bû sebeben derde van feqîr û belengazan. Wisa zanibû ku ev neheqiya wî kiriye. Evv jî cima yekî mî na Ûsiv axare nedbcebitî? Evv jî cem Okeş axa, şev û roj nedigot û kar dikir. Ji cane xwe zedetir, male axe diparast. Bi evaran hemû Ýaşe vvî, bedena vvî, te digot ku bi şiva kutane. Li ber xwe diket. "Fem dikir ku
53
evv najo, Okeş axa ye yekî dine bibîne, bide ajotine. Ev traktora mezin qet vala disekine? Cima di ve dinede xenji Weysel şofer tunebûn? Di be ku ji wî erzantir jî bene, kar bikin. Deste xwe bihejine, vve deh şoferan keve. Evve çi bikira? Qet nebe, kare wî hebû. Nîvî nîvî bi sere xwe bû. Kes tev kare wî nedibû. Wekî wisa nebiya, ev toz, roj û qirej qet dihate kişandine. Wekîji vir here, vve çi bibe? Here gundekî dine. Evv deran jî avvha. Neheqiyen mînanî vira. Ez çi bikim? Qet güne min tü ne. Xwede jî zane tüne. Çi ji deste min te?"
Zeviya mezin hemû hatibû ajotine. Niha dor dihate zeviyen dine.
Çi bû, vve roje bû. Weysel hate sere zeviya ku bi wî hatibû nîşandane. Difikirî, gelo ji kedere dest pe bike? Li ser piya, le dinherî. Li ser ze viye, yekî çil û çüpenc salî, jarik hebû. Sîng û pesîren wî vekirî, kincen vvî û her tiştan nişan dida ku gundîkî pir feqîr bû. Cem vvî, zarokekî heft, heşt salî, li ber du berxan bû. Berxen xwe diçerand. Jinikek jî he bû. Jina wî bû, ruye vve nedihate xuyane.
Weysel, wexta ji dûrve hat, traktör nezîkî zeviye bû, gundî dest û müen xwe ba dikir, işaret dida wî û diqîriya. Dbcvvast beje ku "şûnva here, peşda neye." Weysel daxwaza wî fem nekir, nizanibû. Weysel li ser piya, direjayî û beraya zeviye meze dikir. Niha Weysel li ser trak töre bû, çaven wî li zeviye bûn. Li hîvya gundî bû ku nezîkî wî be. Ge lo çi diqîre?
Çiye brao? Çi dibejî? Çi diqîrî?

Çavva? Eze çi biqîrim? Le eze li ke biqîriýn? Çi kare te heye li zeviya min? Dibe ku min gazî te kir?
Him nezîk dibû, him jî kevirekî mezin deste xwede digirt. Ruye vvî qemitî, ji hersan sor û reş bûbû.
Çi kare min li zeviya te heye? Ez zeviya Ûsiv axa dajom. Ev der cima ne ya vviye? Evvî evder nîşanî min da.
Lexe, ji vira here. Lexe here. Bela xwe negere li vira.
Na biraye min, na. Çi kare min bi te heye? Şaş nebe. Him jî wisa bi neyarî xeber nede. Avvha xeberdan ne başe.
Xidir dakete jere, li benda îşareteka Weysel bû. Deste vvîda hesinek hebû. Jinikjîhate cem mere xwe. Ewjîdiqîriya niha.
Ji vir herin. Yalla. Herin. Em vve naxwazinü!
Gundî li cem jina xwe, ji bere pirtir denge xwe bilind dikir, dida xebera. Eze di jina vvînim, ku tu aniyî vira.
Nede xebera bira. Çera meke ku em qise bikin.
54
Zarokjî hatibû, çaven wî bi hesiran tijî, li ve makîna bi tekeren me zin meze dikir. Ji alîkiye din, ev çilo tişte, peş û paşya vve teselî dikir. Çaven gundî ev herdu meriv nebirî. Zanibû ku cîranen wî piştî qaseke vve li vvirabin. Gelo cima nehatin? Hemûyan di nav xwede xeber da bû ku, "waxta li hevxistin bibe, netirsin. Le şofer ku zevî ne ajot û çû, hemû vve li ber zeviyen xwe bisekiniyan, bi tiştekî mijûl bibana."
Xidir di dile xwede, "ez bi vî hesinî yek û du bi cane gundî kevim" digot. Weysel betir li ser hemde xwe bû. Gundî zimane xwe edî pir ze de direj dikir. Pir peşde diçû. "Qet avvha te xeberdane? We derd û ha le xwe bigota, le ev dide sora, diqîre." Damîş nebû.
Oro, tu çi diqîrî? Mîna meriya xeberdane nizanî?
Ma eze merivbûne ji te hîn bibim? Ere? Tu fem nakî cima? Lexe

here dibejim! Biteyse ji zeviya min! Çi disekinî hela he? Tu dixwazî ku ez sere te bela belayî bikim?
Bihna Weysel jî teng bû. Besebrî hate ser.
Lavvo tu çi merivekî befemî! Aha eze bajom, tu derde xwe ji ke re dibejî, here beje.
Traktör saz kir. Bi hers, lez û bez berve zeviye ajot. Ku gundî xwe nehavetiba alîkî, tekera raste hindik mabû li ser linge vvîre derbaz bi be. Kevre deste xwe ji parre havete şofer û traktöre. Bû vizîniya kevir. Ji parre hat li hesine ser tekere ket û piçekî pelbcand. Ji xwedede li şofer neket. Bihata sere vvî, vve perçe perçeyî bikira. Şofer li şûnve niherî, ajotina xwe berneda. Xidir li pist vvî, li ser traktöre bû. Weysel teme kiribû ku bira peya nebe. Çer û xeberdan hela he dihate guhen vvan.
Di sere vî küre kerede, qet piçek aqü tüne. Hersa meriva tîne.
Merik ji parre kevirek dîsa havet, kevir vala çû. Weysel traktör da sekinandine. Peya bû jere. Xidir beriya wî xwe havetibû jer, hesinek di deste vvîde bû. Gundî û jina vvî, di destande kevir û dar berve vvan dihatin. Küre vvan li pey, him kevir kom dikir, him jî digiriya. Kevirek hat li qalça Xidir ket.
Way daye... Kuro cima tu har bûyî, got û bi hesinve rikefî gundî kir. Merik xwe da alîkî û dest havete hesin. Meriv ji wî bavver nedikir ev lez û quwet. Hesin di desten herduyande bû. Herduyan jî dikişand. Milen Xidir zexm bûn, hesinji ye dinere nehişt. Jina vvîji parre, bi kulman li Xidir dbcist. Kurik digiriya, kevir dihavet.
Weysel li ser hev çend cara bi Xidirre qîriya.
Berde wî hesinî. Berde vve levvye.
55
Xidir levvye nehişt. Weysel le xist ji deste wî girt. Xidir berda, gun

dî jî bi nîv dil dest avîtibûye. Weysel levvye girt û havete alîkî. Hersa xwe bi Xidir hanî.
Tu dînî lavvo? Bersiva kertiye bi kertî naye dayin. Behişo.
Dehfek daye û evva bi dûr xist. Gundî û jina wî dîtin ku Weysel hevale xwere giliya dike û dbcvvaze li wî xe, zede nekirin, sekinin.
We waxte, ji zeviyen cîranan, ji aliye gund, jin, mer û zar bi dirgan, dar û çoye xweve xuya kirin; berve vvan bi lez dihatin. Weysel bi deng û qîrîna vvan zivirî. Niherî û fem kir ku hale vvan xirabe.
Gundî û jina wî ku çav bi cîranen xwe ketin, edî mînanî kesen harbûyîbûn. Xidir qalça xweye eşyayîgirtibû. Çaven wî şaş û veciniqîbûn.
We bi kude bireviya? Herke ku bireviya, vve evv bigirtana, hetanî kuştine ledana. Weysei nerm bû. Difikirî ku vve çavva ji nava vî karî bifilite? Le vvekî lexin, wî bikujin? Le vvekî traktöre bişevvitînin? Oerare xwe da. We levvye hildana deste xwe, pisten xwe bidana traktöre, xwe bipareztana. Le gundî nedihatine xûlîkirine. We bi hineken baqüre qise bikirana. Ku ji vira azabûna, vve ji vir biçûna.
Peşiya gundiya gihîşte vvan . Radibûn, diketin û diqîriyan. Hatine cem Weysel. Weysel qet deste xwe jî bilind nedikir. Bedeng disekinî. Yen ku herî peşîn hatin, dîtin ku Wfysel tiştekî nake, disekine... Evv jî sekinîn. Didane xebera û çera. Kesî le nedbeist. Soro gotibû, "li kesî nexin. Kuştin, birîndarkirin qet tüne. Heta davviye em desten xwe bi lind nakin."
Yen dine jî hatin. Qelebalix her diçû zede dibû. Ji nişkeve bist û penc sî kes bûbûn, hîn jî zede. Ji parre dîsa dihatin. Wexta ku evve porsor, rûzer hat, gişt vebûn. Evv peşde hat. Ev herduyen xerîb di nav gundiyande mabûn. Gundî diqîriyan û didane çeran. Soro, bîhna vvî çikiyayî, singe wî diçû û dihat. Şiveke qalind di destde bû.
Çiye? Çi dibe?

Weysel:
Lo bira. Ev erd nişanî me dan. Ez hatim û bajom. Ev camerî han, qet tiştek negot, bi çer û qelebalix; bi kevir û daran rikefî me kir. Em xerîbin li vir. Ev kirinen ku hûn tinine sere me, ma meraniye?
Evvî bi vî teherî gazinen xwe dikir ku ji davviya qelebalixe hinekan deng da.
Bele, ne meraniye, tu dibejî. Tu cima didî pey axe, teyî vira? Ma di dinede xenji te merxas û düpola tüne bûn? Tu ketî pey vvî, hatî vi ra.
56
Hela bejn û bala xwe meze bike. Tu mînanî mera teyî xuyane. Te fedî nekir, hatî bo zuma xelqe?
De beje. Yen ku tu hanîne vira, bira ben û te xilaskin. Çi bû? Bin here, axa qet ne xuyaye. Bi desten te agir digre. Hişe xwe komî sere xwe bike, lexe here. Çi tere ev deran.
Em derseke baş bidine vvî, paşe bişînin. Bira bibe guhare guhan, ji bo yen ku piştî wî bbcvvazin ben vir. Bira neyene Tendureke. Binherin, em du kesin, hûn pencî, şest. Ji hatina me ya vira hûn aciz dibin. De bejin, ev çeren ku hûn dikin, ev karen cameranin, an na? Emjî di bin emre yekî dinin. Ev traktora benamûs, tu ya mine. Em li ber emre xwayî traktorene. "Ve dere bajo", dibeje, em jî dajon. Ma çi dikeve berîka me? Bo ked û nane xwe em vî derdî dikişinin... Ev kirina vve serme. Şerm û fedî kirina herî mezin eve, ku hûn bi axe nikarin, tene ser me. Dema hûn awqasî merin, merxasin herin li hemberî axe derkevin. Axa zeviyen vve ji desten vve digire. Mer ji yen vvisanre dibejim. We, awqas kes du xerîb hildane nav xwe, ne meraniye ev.
Soro li cîranen xwe vegeriya:
Hela, denge xwe bibirin. Kuro, lavvo, be edebiye neke. Evv li vir

xerîbin. Gunehen vvan jî tüne. Gotinen wî rastin.
Piçekî bîhn hate ber Weysel. Soro li wî zivirî.
Em bene ya vve. Binherin, hûn di nav mede tene mane. Deste xwe direj kir, mala axe û se çar kesen li ber deriye wî nişan da.
Meze bike, meze bike. Li vvir, li me dinherin. Qet kes te, te dipirse? Wekî te li vir bikujin, te ji kîse bave xwe herî. Binher, qet gaveke jî peşde naveje evv axaye ku tu aniye vir. Ne, tu jî bi çaven xwe dibînî? Hişe xwe hilde sere xwe. Li van deran nesekinin. Mînanî berxen ku li dû maka xwe dikevin, pey vvan necin. Bira evv jî bene cem vve, paşe bejin, "bele em bajon." Bibaxşînin birano... Gundît'.ye... Tiştek li vve nebû. Yekî, duda kire qîre qîr, awqas... Evv jî bi zora derden xwe kirine. De herin, oxira vve xerebe. Careka din jî tişten avvha neke birao. Paşe qet baş nabe. Herine kare xwe... Re bidine, bira herin.
Re dane. Weyscl û Xidir li rûyen kesî neniherîn, bi şerm û hers li traktöre sivvar bûn. Qet pirsek jî, ji deven vvan derneket. Lebûn ku bifetisin.
Berve cîhe ku tişten vvan lene, çûn.
Ketin nava ciyen xwe. Di bin çadireke kevnde bûn. Weysel cbcarek vexist, yek jî da Xidir. Dîsa bedeng. Weysel li ser piste veleziya. Van gundiyen feqîr, jin û zaren xwe anîn peş çaven xwe. Qet nexwestî, be dil tevî vî karî ne baş bûbû. Li peş gundiyan gelekî piçûk ketibû. He-
57
qe vvan hebû. Paşe di xewre çû. Xidir li quncike dine dihenijî. Herdu jî vvestiya bûn.
Gundî, hedî hedî vegeriyan ciyen xwe. Alîkariya hev kiribûn, tişte kî baş bû ev. Di dile vvande sivikayî û firehtî hebû. Xenji ve re tunebû. Di hişe hemûyande cî girt, ev kirina. Hinek difikiriyan, vve ji vir ha çi bikirina? "Le vvekî her çûyî, kar germ û li tevîhev bibe? Wekî cendir

me bi tivingen xweve bene. Li tara hustiye vvan sivvar bibin, le paşe..."
-XIVWeysel
gelekî li ber xwe diket. Hindik mabû, cane xwe bide, le Ûsiv
axa ji ciye xwe nelipitîbû. Welate wî hate bîra vvî. Cima evv der jî ne vvilo bû? Axen Meraşe, cima pir baş bûn? Evv betir zorbe bûn. Xirabiya kesnedî dikirin. Him bi fesal û bi hine tehren nû.
Her tişt xilas bû, Ûsiv axa hat hale wî pirsî. Gelekî bekef bû Ûsiv
axa, vver digot. "Eðer ku hinekî sebir nekiriba, vve bihata û bi tivinge yek, dudu birîndar bikira anjî bikuşta. Ji xwedede tiştekî wisa ji dest derneketibû. Gundiyan Ûsiv axa rind nas dikir û zanibûn, levvra tiştek bi Weysel nekiribûn..."
Ev vir û derevv he jî Weysel diqehirandin. Meriv, gerek bi zimane xweve rastbe. Bîze wî hat, nedbcvvast edî Ûsiv axa bibîne.
Ûsiv axa gelekî xeber da. We se çar xulamen xwe bi tiving pere bişanda. Le Weysel dîsa jî razî nebû. Nezîkî zeviyan ne çû. Ûsiv axa xwe negirt û hersa xwe vvîre anî. Te digot ku xwaye traktöre, axe vvî, Ûsiv axaye.
Niha bira ev traktör vala, be kar bisekine? Ma ne gunehe? Tu
peren xwe bistîne, li ser piste raze. Traktör jî be kar bimîne. Ma xwede qebûl dike?
Ûsiv axa, ez karkerim. Ez şoferim. Le ye kc? Ye Okeş axa, ne ye
te.
Ha ez, ha evv. Çi ferq heye? Em herdu cima ne şîrîkin?
Ez tişten wisa nizanim. Ez nikarim xwe bavejim ber mirine. Eze
zaren xwe binherim, ne tu. Meriv bimre, kes aveke sar jînade kesî. Loma jî, ez di vî karîde tuneme. Eze bixebitim, şev û roj... Le, li wî erde
ku be derd û be belabe.
Bi ya Weysel biya, vve hemû tişten xwe kom bikira û biçûya. Ûsiv

axa, vve biçûya cem Okeş axa û cendirme qumandarî, ji bo şîkate gun-
58
diyan. Levvra Weysel dikaribû benda axe xwe bisekine. Parîkî vve bîhna xwe hilda. Hela ka axe wî çi digot, çi dikir?
Ûsiv axa hate bajer. Her tişt ji qumandarre got. Hinek tişt jî dane ser; "Gundiyan vve bi çekan şofer û hevale wî bikuştana. Xwede kir ku axa û çend meriven wî gihîştibûn. Ji nav desten vvan xilaskiribûn. DU dikirin ku axe jî bikujin. Qaymeqam û cendirman jî naxwazin, evv alîkariya axe dikin. Eðer ku nebe vve vvan jî bikujin. Qanûn çiye?"
Bi alîkariya telefona cendirman li vilayete, bi Okeş axare xeber da. Nesekine. Zûtire vvere, got.
Bi telefone kem tişt göte Okeş. Gundiyan hevvekî kirine qîrîn, şofer naxwaze traktöre bbcebitîne. Li bajer li benda wî bû. Zivirî li alî cen dirme qumandarî:
Ev teresen tirsonek jî derdin ha. Nika ya rastî jere bejim, ji vila yete naye vir. Levvra min got ku tiştek tüne. Bira zûtire be.
Okeş axa nîvro şunda hat. Navroj tev xwarin. Ûsiv axa yen bûyî li gor dile xwe jere got. Yek û dudu yen pexas, xwe nezan kirine mirte mirt, şofer jî levvra zeviyan najo. Kar nîvçe hiştiye.
Lo Okeş, ev çiqas be aqüe? Vî zemanî, qet traktör rojeke jî vala disekine? Te awqas pere dan, min jî gundek temamî.
Ûsiv axa, ya ku ez zanim Weysel ne tirsoneke. Min jî, male min jî mînanî cane xwe hezdike. Merive minîherî başe. Nizanim çi bûye? Te jî çi got axa? Çi cesûre lo? Hela he te negotibû "ha", reviya.
Paşe min je re got, vvere ez kesen bi tiving bidime cem te, gazî cendir man bikim. Min kir û nekir nebû. Paşe jî min gazî te kir. Min got, ez jî şerîke axeme. Him jî bi senet û qewl. Cima gura min nakî?
Bi van gotinan dbcvvast ji Okeş axare beje ku evv jî nikare xwe şûnva

bikişîne. Zanibû. Ev bi femin. Zû te digehejin. Bira rind texe bîra xwe. Ji vî karî dest kişandin nabe.
Çi kir, kir û bîr û bavveriya Okeş anî re. Tev çûne cem cendirme qumandarî.
Qumandar vve bi cemdirmanve bihata gund. We derseke rind bida gundiyan. Di guhe Okeşde got, "sed panotekî bidime qumandar, çend kesa li qereqole miz bide, paşe denge kesî dernakeve."
Okeş axa bi xwe jî hostaye van karan bû. Dizanibû, ku gundî nikarin li van erdan bibine xwayî. Ûsiv axa serîde qet qala van tiştan nekiribû. We çaxe qet ne ledivvaliya. Çi kare wî hebû di nav tişten avvhade. Paşe her tişt bihîstibü. Le bele nikaribû vegere û tiştekî bike. Ye bûyî, bûbû edî. Ev Ûsiv axa doste qumandar bû. Nişan dida ku hemû sereşan dikare pe hal bike.
59
We cîp bigirtana, biçûna gund. Oumandar çar cendirme peşyeve şandibû. Evve jî ji parre biçûna.
Okeş û Ûsiv axa diçûne oda qumandar. Ûsiv axa li peşiye bû. Be tirs û be xem sed panotekî heşîn kire berîka vvî. Paşe gazî Okeş kirin, evv jî hatibû hundir.
Evv çar cendirme dibe ku tere nekirana. Du heb jî hildabûne cem xwe. Waxta ku gihane gund edî esir bû.
Okeş çû cem Weysel, gelekî bi pirçîbû. Ji axe xwere xerhatin got û xwe berhev kir.
Çavvanî Weysel? Çibû di pey minre? Waxta ku ez li vir bûm, ti ştek tunebû.
Axa gelek tişt hebûne, le me fem nekiriye. Piştî xilaskirina vve zeviya mezin, dor hate ciyen din. Gundiyan got, "eme erde xwe bi xwe bajon, em nadine kesî." Nehiştîn. Pencî, şest kes hatin ser min û Xidir.

Me hevdu bir û hanî. Heger me bi aqüî nekira û di nav vvande yek duduyen
bi aqil nebûna, hale me ne tu hal bû. Teye niha cendeke me li
vira bidîta. Ûsiv axe te, qet ji ciye xwe jî nelepitî. Her tişt qedya, paşe
ji mala xwe derket, hate ba me û got: "Na mine dardekira, mine bikuşta.
Nizam çi û çi." Ji bo vve jî axa, ez di vî karîde tuneme. Tu zanî, se
re min di riya tedaye. Em doste doste hevin. Ez te dost zanim. Ji döş
te xwere mbcenetiye nakim. Le bele, jin û zare min jî hene. Ji bo xatire
Ûsiv axa, xwe navejim nav eðir.
Hela meqehire Weysel. Fesal bike. Em bûne şirîke vvî, Weysel.
Gerek em vî karî heta serî bibin. Me wisa qewl kir, ne vvisane?
Bele vvisaye. Di serîde jî qet çaven min Ûsiv axa negirtibûn. Le
bele em tevî kare mezinan nabin. Avvha hîn bûne em. Levvra min ji te
re jî tiştek negot.
Heqe te heye Weysel. Ji minre got ku meriven mine bi çek Weysel
û Xidir xelas kirine. Way tirsoneke bedii, vvay!.. Ji mala xwe derneket
ha!
Derneket axa, derneket. Ya rastî, ye ku min aciz dike jî, eve. Bi
tuyî tuneyî, eme ji bo zeviyen Ûsiv axa bimrana. Dest û lingen te radimûsim,
em ve dere bihelin û herin. Cîkî bi belaye. Ne mîna zanebûna
teye. Tiştekî bi derde. Eðer ku nabe, destûre bide min, ez herim ma
la xwe. Kare te avvha nîvcî hîştin, ji minre ji mirine xerabtire. Tu jî za
nî. Le ez çi bikim?
Hela bisekine lo. Eme tiştekî bikin niha. Ji yekî xilas dibin, bi ye
kî din divvalin... Niha cendirme vve vvan bînin re. Paşe tu bederd, dikarî
kare xwe bikî, bajoyî. Van galgal û qelebalixe nenihere tu.

Na, axa. Piştî çûyina cendirman vve dîsa ben. Ez nizanim. Le vvi sa fem dikim ku evv ne mînanî yen dinene. Yek jî, min duh le niherî, düe meriyan dişevvite. Ev Ûsiv axa neheqe. Gelekî neheqe. Gerek em nebin şirîke neheqiya vvî, axa.
Ne tu zanî. Me pirs da hev. Me cem noter sened çekir. Qewl da vvî. Em ji pirsa xwe bizivirin, vve bîst penc hezar panota ji me bistîne. Traktoreka baş û nû jî qasî bîst penc hezarî dike. Gerek em kare vî ka fire küre kafýra bikin. Reka din tüne.
Weysel sere wî di berda, te digot ku lava dike.
Lava dikim axa. Min tevî vî karî neke. Eme parîkî nan bbcvvin, bira tevî neheqiya Ûsiv axa nînbe. Paşe kar û keda me jî bexer dibe. Min bibaxşîne. Anjî ez herim traktoreka dine. Bira hevalekî dine be. Oumandar, çar cendirmen bere hatibûn û duduyen ku bi xwere anîbû kişandibû qûncikekî, emir dida vvan.
Çaven xwe rind vekin. Çi dibe, çi nabe? Çeken xwe vala bikin.
Tiştekî betam naxwazim. Kînge min emir da, hûn hazir bin. Zirare nedine kesî. Bira ji vve bitirsin, le derdekî, sereşeke neynine peşya me.
Guhe xwe bidin hela ka gundî çi dibejin. Di gundde çek hene an na?
De ez vve bibînim!
Sersera, qumandare min!
Yek, yek çûn, nezî gundiyan bûn. Guh dane dora xwe.
Gundiyan, vve şeva ku ev tişt bûbûn, heta derengî bi hevre qise ki ribûn. Mijûl bûn... Rind zanibûn ku cendirme vve ben gund. Bo ajotina zeviyen vvan, traktör vve dîsa be. Piştî van xeberdanen dûr û direj qerare xwe dan. "Eðer gazî vvan bikin, vve biçûna. Qet kesekîji vvan rikefî kesî din nekiribûn. Qet nizanibûn ku ke şoferre daye çera û beziyaye. Le ku şofer vvan nas bike, nişan bide, li ser bihîstina qîrîn û qelebalbce, çûne vvira. Evv xorte, alîkariya şofer dike, wî bi xwayî zeviyere

dabû xebera û dehfandibû. Tiştekî awqas mezin nîn bû. Paşe vve dî sa bihatana li cem hev û bifikirîna. We çavva bikin û çi bikin ku trak töre ji gund dûr bixin. Gerek neqehirîna, hers nebûna. Hela ka xwede çi nîşan dide."
Oumandar gazî Weysel û Xidir kir. Yen bûyî ji vvan pirsî. Paşe vve gotinen vvan derbazî kaxizan bikira, bida navnîşan kirine.
Weysel:
Pey zeviya mezin, Ûsiv axa hine ciyen dine nîşanî min da. Ez çûm ku vvedere bajom, hinek hatin, bi mere kirine qîre qîr û bezyane me. Xwastin rikefî me bikin. Paşe hineken dine hatin. Çer û pevçûn çebû.
61
Gotin çi kare vve li vira heye? Hinek ketin nava me. Em jî dûr ketin û hatin.
Çend kes bûn, evv?
Gelek bûn. Min nejimirî, le çil, pencî hebûn.
Di deste vvande çi hebû? Çeken vvan hebûn an na? Çend hevv ji vvan bi çek bûn?
Yen bi dar û şiv hebûn, le min yen bi çek nedîtin.
Li aliye Xidir vegeriya û je pirsî:
Yen bi çek hebûn?
Na xer, bege min. Yen bi çek tüne bûn.
Rind bîne bîra xwe, qet kesî bi çek tunebû?
Na xer, bege min.
Oumandar pirçiye xwe kir. "Ev çilo gotinin? Çeken vvan ku tunebin, eze niha çi bi vvan bikim? Qet." Dile xwede avvha derbas kir.
Nave vvan dizanî?
Na xer. Em nû hatine. Me cîkî din kar dikir. Kesî nas nakin.
Wekî vvisane. Tu ku vvan bibînî, te nas bikî?

Weysel kete şike. Nedbcvvast, nave kesî beje. Ji bo Weysel, di dinede kare herîbenamûs û herî rezîl, îxbarkirina xelqeye. Evv bizanibe ku evve be darda kirine, dîsa jî nake. Paşe kevir û kuçik li pey merivan diqîrin û îxbar kirina wî dibejin. Levvra mezinan gotiye; kesen herîbeşeref, meriven avvhane. Xwe zûtire berevî ser hev kir.
Nas nakim. Texmîn nakim ku ez nas bikim.
Evve porzer, porsor, evve zexm û bi goşt ku alîkariya wî kiribû, ji bo xüaskirina wî xebitîbû, hate bîre. Gerek evv jî negota. Alîkarîkirina vvî jî qise nekira. Paşe vve ji wî bipirsiyan, cane wî bi eşandina. Heger xwayî zeviyan dibejin, guneh ye vvane, ne ye mine. Ez bi namus û merivtiya xweve bijîm. Çi minre yen dine, got di dile xwede.
Ev çi kar bû îro? Qet kesek ji gund nezîkî vvan nedibûn û peşde nedihatin. Bûyînen nava gundiyande, kî bi pir cîran û qelebalix be û kî gelekî denge xwe bilind bike, wisa texmîn dikirin ku vve bi heq be zanîn, loma jî bi lez dihatin havvîrdora vvan digirtin. Le bele, îro ne wisa bû. Saetek bû ku evv hatibûn, le gundiyek jî nezî vvan nebûbû. Te digot, hemû bi hevdu şevvirîne. Ev çiye? Gelo yek aqil dide vvan? Na lo, kî vve aqü bide?
Oumandar ev hanîn bîra xwe. "Gelo ji min û cendirman ditirsin, levvra nayene? Min çi li vvan kiriye? Ez tu cara nîşan nadim ku ez ali ye Ûsiv axa digrim." Ji nobedarre got, bira gazî meren gund bike. Ji
62
xwere jî avdevvek xwest. Tasa mezin tijî avdevv, hilkişande sere xwe. Li heviya gundiyan ma. Oedereke şunda, gundî hedî hedî, yek û dudu ne zîk dibûn. Te digot, hema hema hemû gundî hatibûn. Li ber derî Okeş, Ûsiv axa û li cem vvan jî Weysel û Xidir disekinîn. Di ortede qumandar rûniştibû. Şewqe xwe dabû ser çoka xwe, kursîk li cem bû, li ser vve jî hinek kaxiz hebûn. Yen nû dihatin nezîk bûn, peşve çûn. Şewqen

vvan di destde bûn. Hemû bedeng, bi meraq nîn bûn. Te digot ku her tiştî ji bereve dizanin vvekî vve çi bibe. Bexem li dora xwe diniherîn. "Te em îxbar kirin", digot çaven hemû gundiyan û li ser Weysel bûn. Weysel jî mînanî vvan rehet, vvekî dostan li vvan meze dikir. "Ez jî mî nanî vveme" digot çavven vvî.
Okeş bi hatina xwe hezar carî poşmam bûbû. "Ji ruye min, hûn van derdan dikşînin", difikirî û nikaribû li ruye gundiyan binhere. "Heke eznehatama, vvaha jî nedibû... Le careke hate sere min jî... Walle û bi-11e min jî nedbcvvast."
Ûsiv axa dilgeş bû. Her tişt bi ser xwastina wî diçû. Kefa wî di cîde bû. Okeşji her alîde rind gireda bû. Evv nikare vegere. Heke hezdike, bira şûnve bizivire. Nîvî gundiyan çûne, nîviye dine nizane ku çi bikin. Berîka çend memûren bajer germ bike, hemû tişt diçe serî edî. Qumandare
niha vvan rind bîne re. Bira roja xwe bibinin. Bira bizanibin
ku dine çiye. Mirtezaye seroke partiya nû, bere zedetir li wî digeriya, pirsa wî dikir. De vve çi bibe, bira bibe. Kîder zirave, bira ji vvedere biqete. Ciyekî minî zirav tüne. Ye şikestî ziraviya pişta vvane... Ji minre
ne derde.
We rikefî şofer kiriye. Wiye erde Ûsiv axa bajota. We xwastiye
ku wî bikujin. We cima wisa kir? Ke kir? Yen kirî peşte derkevin.
Heşa bege min. Me tu kesî ku bbcvvaze vvan bikuje nedît.
Le vve çavva bibe? Dar, dirgan û çek di destde, hûn çûne ser merikan.
Kesî bersiv neda bere. Paşe yek û duda:
Na xer, me tişten wisa nekir, gotin.
Ûsiv axa her tişt zanibû. Bi xwe neçûbû ber zeviye, le ji dûrve niherîbû. Evv pencî şest gundî yeko yek nas dikir. Paşe, nobedar Şukrî
xeberen rast hemû jere gotibûn. Ûsiv axa dikaribû hemûya jî yek bi

yek bijbere û beje. Le qet tiştek bi şofer nebûbû. Yek jî, evvî bi xwe di got ku "ez kesen ku rikefî me kirin, qet yekî jî nas nakim." Gundî jî em ne li vvir bûn dibejin. Tiştekî din ji deven vvan dernakeve. Tirsonekan. Dbcvvazin li yekî xerîb xin, paşe bi tirsa cane xwe, ne em bûn, dibejin.
63
Eðer cendirme çend gundiyan li qereqole bikutin û miz bidin, baş dibe. Le vvekî dîsa jî neyen re? Kar vve çaxe gelekî dilevvite? Ev gundî ji ku bûbû bela sere vvî?
Oumandar, Weysel gazî cem xwe kir.
Li ruyen giştan binherin. Dibe ku hûn nas bikin. Kî hebûn ji van? Bijberin!
Weysel yek, yek li peş vvan sekinî. Li ruye vvan meze kir û derbas bû. Li peş Soro, çaven vvan li ruye hev sekinî. Bi dostî li hev niherîn. Paşe dîsa çû peşiya hineken din. Heta davviye çû, qumandar jî pere bû. Zivirî û got:
Na xer, min qet yek jî nas nekir.
Te çi got? Qet yek jî nas nekir? Qet yek jî ne mîna vvane? Tu ye kî çi qasîbeaqüî? Te qet li rûyen ku dbcvvastin te bikujin neniherî? Anjî ji tirsan te sere xwe kire nav şeqen xwe. Ev çi hale?
Weysel qet hilneda ser xwe. Gundiyan rind fem dikir ku Weysel evv nas dikir, le nedigot. Oumandar ve çare gazî Xidir kir.
Hela careke jî tu mezeke!
Xidir li ruye Weysel niherî. Paşe wî jî mînanî VVeysel kir. Hinekî lez meze dikir. Vegerî û got:
Na xer, bege min. Min jî kes nas nekir.
Oumandar gelekî bi hers bû. Di dile xwede hine tişten nû difikirî.
De hûn dizanin. Tiştekî ku ez bikim tüne.
Kef bi dora leven wî ket. Li ser qelebalixede qîriya.

Li vî gundî, de bira dîsa tiştek bibe, xwede dizane eze cane we bistînim. Bi namus û be şer di ciye xwede rûnin. Yen ku naxwazin, bi ra bicehnimin herin. Kude diçin bira herin. Bira kes bela xwe bi kesî nede. Hemû di kare xwedebin. Lo lavvo, hûn ji traktora xelqe çi dixvvazin? Li vira du cendirman dihelim. Eze emir bidim, ku kî nerihetiye derbixe, bira li newqa vvan xe. Bi tiving û gullan. Hûn jî şofcrnc, bela xwe di gundiyan nedin. Yen ku lene vve bikujin, hûn nas nakin... We bajar hemû tevî hev kir.

Paşe diçû û dizivirî. Şûnve diçû, paşe dîsa dest bi xeberdane dikir. Rewşa gund xirab nekin. Mînanî merivan bi hevre bijîn. Hûn çi dixwazin? Em hemû karen xwe bihelin û bi vvere mijûl bibin? Qet dîn, îman tüne li cem vve? Qet hûnjixwedejînatirsin? De, careka din jî ti ştekî bikin, bibinin ez çi dikim. Bibînin qanûn çavva deve meriyan diçirîne. De hûn merin tiştekî bikin.

64

Got û got. Te digot ku gundiyan qet guhdarî nedikir. Hemûyan ro jen xwe yen dihat û karen xwe difikirîn. Ceren wî li ber guhen vvanre derbas dibû û diçûn.

Ez diçim. Hûn hemû jî gurra cendirmen min bikin. Hûn ji min re çavvanin, ji vvanre jî vvisabin. De biteysin herin, bicehnimin herin. Gundî hemû vegeriyan û hedî hedî çûne nav gund. Ûsiv axa û Okeş di quncikekîde qise dikirin. Tev qerar dan ku vve Weysel bişandina ber traktoreke dine, şofere ya dine bihanîna vir. Heger tiştekî din dernekeve,

du roja şûnve vve dest pe bikirana. Weysel û Okeş axa vve bi qumandanre biçûna bajer. Paşe ji wira vve bireketana berbi traktora dine. Ûsiv axa vve du xulame xwe û nobedar Şukrî bişanda alîkariya Xidir. Yen her şev heta sibehî nobedarîbikirina. Tiştek neye sere trak

töre. Pey hatina şofere nû jî, gerek du nobedar hebûna. Çend quruşen vvan vve biçûya, le ne derd bû. Çi dibe, çi nabe. Naye zanîne. Le vvekî bihatana, traktör bişevvitandina? We çaxe vve çi bikira? Du cendirman vve Rewşa gund meze bikirina û paşe biçûna bajer.
Oumandar evv cendirmen ku vve li gund bimana, şîret kir. We li ma la axe razana, bbcvvarina û vexwarina. We li peş gundiyan serhişkbûna, le li kesekî xistin û birîndar kirin nedibû. Heke ku bizanibûna ti şten nepak vve bibin, zûtire xeber bişandana qumandar.
Paşe yen çûyî, çûn. Şeveke reş û tarî dakete ser gund.
-XVÛsiv
axa gazî Eso û Hesen kir. Ev herdu û Şükriye nobedar, yen ji vir ha, her şev li ber traktöre bisekinîna û biparastana. Tivinga nobe dariye û debancek jî vve bi vvanrebiya. Gerek kesî niza»ýibiya ku axa debance daye vvan. Gerek nîşanî kesî nedana û badilhevva bi kar nehanîna.
Her se jî vve bi roj li ser karen xwe buna. Her şev yek ji vvan, heta sibe hişyar, li ber traktöre biya. Ji bo vî karî her yekî vve mehe sed panot bistanda. Niha ke dikarîbû awqasî bi deste xwe xe? Meha memûran
du sed û se sed bû. Çi dbcvvastin edî?
Hersekan jî bi dil qebûl kirin. Bi vî tehrî, sebeben xeberdanen Eso û Hesen li nav gund derkete ronahiye. Herduya jî car cara li malen çend cîranan fesadiyen xwe dajotin. Kembejîdîsa yek, du cîranan guh didane gotinen Eso û Hesen.
Weysel çû, le kes nehatibû devvsa wî hela he. Xidir dbcvvast ku van hevalen xwe yen nû baş nas bike. Car cara li ser bûyînen gund xeber
65
didan. Du roj û du şevan li cem traktöre veleziyan û razan. Şeve qet

tiştekî ku je bitirsin nebûbû. Bi kef li hevya şoföre nû disekinîn.
Ûsiv axa xeber hildida ku di gundde xemeka giran heye. Hinek poşmam bûn ku zûtire ji gund neçûbûn? Hinek ditirsiyan ku li gundde vve bûyînen mezin bibin. Çend cîranan, "axa hine erde nû bide me, em dest pe bikin, bajon" digotin. Hema ji kedere dbcvvaze, bira ji vvir bi de. Le bele, çend mal jî hebûn ku meriv qet nizanibû ku evv çi dbcvvazin û vve çi bikin? Bi ya vvan axa neheq bû. Gerek bi komekarî hembe rî wî bisekinîna. "Axa, du se malin, emji hefte mala zedetirin. Çi dibe bira bibe, le eme li peş bisekinin" digotin. Meriya nizanibû ku evven avvha çend malin. Kî li aliye keye? Nedihate zanîne. Yekî ku avvha di fikirî, paşe bi curekî din xeber dida. Anjî yen ku ditirsiyan, te dinherî ku bizot û germ, bûne dijmine axe.
Hesen û Eso, ku gundî didîtin, seren xwe berjer dikirin, derbas di bûn. Ditirsiyan ku gundî vve li ruyen vvan bejin, ku evv hatine fýrotine. "Wekî gundî li devvsa me buna, ma qebûl nedikirin?", car cara vvüo difikirîn
û dixwastin ku herine cem cîranen xwe. Le paşe şerm dikirin, xwe şûnve dikişandin. Li hinek ciyan, bi dizî û tele tel digotin ku axa bira zeviyen nû bide, em bajon, ev ji mere baştire.
Se roj bi pey çûyîna Weyselre, berve evare şoföre nû hat. We edî dest pe bikira. Du cendirme, nobedare vvî, vve li ba wî buna. Her tişt vve baş biçûya. Şoföre nû, ji Xidir hîn bûbû ku qet tu kemasiyen vvan tunin.
Soro û Mîro vve şeve tene man û difikirîn. Yen ku li gund dibûn, hişe meriya hünedida. Hinek dixwazin, çi dibe bira bibe, le li hembe rî axe bisekinin. Hinek cîran ne mînanî bere bûn, niha betir nerm bû bûn. Levvra gerek meriya cesaret û xîret bida vvan. Tev xeber bidana û texistana hişe vvan ku reke dine tuneye. Gerek vvan jî îna bikirina,

guman bihanîna. Be bavverî, qet tiştek nedibû. Hişen vvan gerek ev ti
ştan fem bikirana û bavverî pe bihanîna. Bi yekbûn û tevayî li hember
sekinandin. Hişe vvan ku hünede, dilen vvan jî taqet nake. We çaxe her
tişt tevî hev dibû, desten vvan jî di paşila vvande dima. Hinek tiştan ge
rek ji hemû gundiyanre negotana. Hinek bi quretiye, hinek bi zev-
zekbûne
li deven xwe nabin xwayî, qise dikin. Derd û belan tînine seren
xwe. Bi vî teherî qerar dan.
Xwarziye Soro, Elîxortekîjîre. Ye feraqeke tijî nift bikin, bidine.
Bi şev, berî berbanga sibe, wexta ku çaven meriya ji xewe ji hev venabin,
Eliye nezîkî traktöre bibe, nifte li tekeran û her dere vve bide. Paşe
66
agir berde, bi xwe jî bi lez û bez bireve, dûr bikeve. Xenji ve, reke di
ne nedihate bîra vvan.
Gazî Elî kirin, li cem xwe dane rûnişkandine.
Binher xwarziye min, Elî can. Eze tiştekî ji tere bejim. Te biku
jin, goşte te bidine ber gûzana, çerme te zivvel zivvelî jî bikin, gerek
ji deve te pirsek jî dernekeve. Ne niha, ne jî paşe. Eva gerek heta mi
rine li cem tebe.
Ser sere min xalo. Walle min bikujin jî kesîre nabejim.
Elî bavo, netirse. Guh û çaven me vve li ser tebin. Tengasiyede
eme bene hevvariya te.
Li ser van gotinen xale xwe, Elî meraq kir û fikirî. Xale wî heta ni
ha tiştekî giran û bi tirs jere negotibû. Karek hebûya jî Soro bi xwe di
kir. Gelo cima niha ji Elîre digot? "Guhen me, çaven me li ser tene.
Netirse." digot. Nişkeva xwe şaş kir û bedeng ma.
Neke xem Elî. Tiştekî tirşe tüne. Min xwast ku te rind hişyar bi
kim, lema wisa got. Xeberdana xwe nebirî.

Tu zanî, em çi dikşînin ji deste axe. Zuma wî ne bes bû, çû, îcar jî traktör kire bela li sere me. Gund bela belayîbû. Hemû bi çol û baniyan ketin. Niha, heke em ve traktöre ji gund dernexin, eva mirina me hemûyane. Tu çi dibejî, ere xwarze?

Elî hine tişt texmîn kirin. Tirsa wî kem bû. Niha betir rehet bû.

Xalo, tu çi beji eze bikim. Ez jî zanim, ev traktora ku axa aniye, vve me xizan bike. Hûn ji min mezintirin, ji min baştir dizanin... Ez li ber emre vveme. Tu û ape Mîro, hûn çi dibejin, eze bînime cî. Bejin bimre, eze bimrim.

Şevvitandina traktöre niha bi tevayî difikirîn. Gerek tiştekî wisa bidîtana, tijî nift bikirana û xwe jî deng neda. Du qutî kibrît tekirina li her berîkeke xwe. Tu tiştekî sipî li xwe nekira. Bi şev, eli waxte xewa girande, vve nezîk bibaya û nift pe bireşanda, agir berda. Bi xwe jî mî nanî birûskeke ji vve dere dûr biketa.

Mîro tevî pirsan bû. We nift tekirina eyare mote. Yekî ji vvan gele kî nift hildida. "Tijî bike, bide pişta xwe, deve vve rind girede. Paşe xwe bi erdere bikişîne û here. Saeteke jî wisa herî, tiştek pe naye. Li ciye çûyî kare xwe bike. Bedeng, ker û lal."

Kete hişe vvan. Soro, ji bereva nift anîbû bîra xwe. Levvra hedî hedîji mala xwere nift kirîbû. Hinek jî li mala Mîro hebû. Hanîn. Eyare ku mot dikirine, av jî je nedinuqutiya. Nift kirin eyer. Nîve şeve, li pi şta gund, Elî re kirin. Evve biçûya, ji dûrve biziviriya û ji paşve vve ne zî traktöre bibiya. Di evv erden ajotîde, mînanî maran vve xwe bi erde-

67

re bikişanda. Dema ku agir bi traktöre ket, deng û behs li nav gund hate bihîstin... Soro û Mîro vve hedî hedî bihatana nav gund. Pevvîst bû ku qet kes ji vvan nekeve şike. Ye herî nezîkî vvan jî... Ji Elîre debancek jî tivdarek kiribûn ku dema kete tengasiye bi kar bîne. Soro û Mî

ro di nav ciyande xwe direj kiribûn. Bes xewa herdûya jî nedihat. Guhen vvan li der bûn. Her çiqas vvan jina Soro ji xwe dûr xistibûn jî, dî sa jinike hemû tişt fem kiribû. Ji bo ku Soro û Mîro berxwe nekevin, ji derevvan xwe xistibû xewe. Xalojina Elî û Elî ji hevdû gelekî hez di kirin. Soro ber xwe diket ku cima xwarziye xwe tevî vî karî xeter dikir. "Heger te bikî, bi xwe bike, vî tifalî cima davejî nav eðir." Hemû gun dî dikaribûn ji Soro biketina şike. Le bele kesî Elî meriv hesavv nedi kir. Ji ber ve yeke jî şik nedibirine Elî. Levvra, Soro xwarziye xwe şandibû. "Bira çaven gişkan egîtan bibîne." Soro bi xwarziye xwe pir dibcvveş bû. Zanibû ku düekîvviyîgcrm, dost heye. Di zarotiyede diyar di bû. "Gaye çe, ji goliktiya xwede te xuyakirin." Ev gotin ne badilhevvane. Dema Elîşevereşede dimeşiya, nişkeva bi tenebûna xwe hesiya. Veciniqî, te digot ku ji dile wî tiştek qetiya. Dile wî li ser hev dikuta. Piye vvî li kevirekî piçûk ket, terişî. Ev çibû? Gelo ditirsiya? Eyare nifte li pişta wî bû, bi dest pîva, giran nîn bû. Çiqas dile wî bbcvvasta, dika ribû xwe xûz û xar bike û di bin vî barîde biçe. Di berîken vvîde jî ki brit hebûn. Li debanca di paşila xwede niherî, di cîde bû. Bavveriya xwe bi xwe anî. Oedereke re çû, rehetîk hate cane vvî. Tirs û xof ji ser xwe havet. Wekî ku tiştek nebûye, meşiya. We traktöre bişevvitîne. Yek, yek hanî ber çaven xwe. Hedî hedî kete riya Zilane. Paşe xwe da bin tara Kaniya guriyan, berve çem zivirî. Gund bedeng bû, dine di xevvede
bû. Zeviya ku bi traktöre nû hatibû ajotine, di sere vvere vegeriya. Ji paşve hat û hedî hedî berve traktöre diçû. Niha her betir hişyar û li der dore xwe dinherî. Heger tiştekî ne baş bibiya, vve xwe bi erdeve bizeliqanda û bisekiniya. Meşa di nav şovede pir zehmet bû. Piçekî peşde çû, xwe xûz kir û wisa meşiya. Reveçûna bi vî tehrî ne hesan bû. Paşe pişta wî eşiya, xwe rast kir. Ji bo ku nebe xeterî, dîsa xwe xûz

kir. Hinek re hilda. Tirs û xof kete cane vvî. Xwîdaneke sar pe ket. Eniya vvî bi xwîdane şil bû. Di alîkîde jî dile wî rehet bû. Wek miroven ku tiştekî baş pek anîne. "Le ku pek neynim, beme girtinc û rûreş bibim? Ev kara ji bin sere ke derketiye, vve be zanînî."
Wek maran bi erdere zeliqî, xwe peşve dikişand. Nezîk bûbû. Ça ven wî edî, traktör û ciye razane ji hev derdixist. Hinek xwe da alîkî ku traktöre û der doren vve baş bibîne. Sekinî. Bîhna xwe hilda. Dest bi-
68
re berîken xwe. Çarbcen wî sivik û be deng bûn. Bi vî tehrî qedereke dîsa re hüda. Li peşiye, reşaya tu tiştan nedihate xuyane. Başe... Gelo hemû di hundirdene? Serma şeve, evv cemidandin û ketin hundir? He jî nezîk bû. Güme guma dile wî bû. Çavva jî bi deng dikuta. Te digot ku denge dile vvîbedengiya şeve dişkene. Car caran çöken wî düeriziyan. Leven xweyen zûha dadüest.
Bele, niha ji traktöre sîh metro dûr û li peş ciye razane bû. Tu ti ştek nedilipitî. Her zede nezik bû. Di navbera wî û traktorede bîst me tro ma bû. Çaven wî li ser tekeren traktöre yen mezin bûn. Hesinen paşiye çüo zexm bûn. Römork jî nezî vvan bû. Di reşaya şevede hemû tişt li ber çaven wî betir mezin dihatin xuyane. Li peş traktora terikî xwe gelek piçûk didît. Hejî çû, nezîk bû. Careke din jî li der dora xwe meze kir. Li peş traktöre tiştek hebû. Mîna merivekî, veleziyayî. Seki nî. Baş niherî. Bele, merivekî razayîbû. Ji tirsan ricifî. Heke ku fedî ne kira vve biziviriya û biçûya. De çi dibe, bila bibe. Çend metro dîsa peşde çû. Ji tivinga Şûkrî, evv nas kir. "Wey seg bave seg bav, Şiko, mirina te deyne hustiye mine, bes kare min niha ne eve."
Şev roj Şûkrî dişandine kar, xew ji çaven wî dinuqutî. Mînanî miriyan. Mirîdikaribûnji ciyen xwe rabin, le Şûkrînikaribû xewa giran hişyarbe. Elî, ev yeka baş zanibû, levvra pir dibcvveş bû, dema ku Şukrî

naskir. Kare wî edî hesa bû, heke tiştekî nû dernekeve. Çaven wî hînî tariye bûbûn. Hinekî dîsa nezik bû. Her tişt rind ji hevdû diqetand ni ha. Şûkrî, li ber sere wî tivinga vvî, li peşiye traktör û ciye razane, gişt, hemû yek yek ferq dikir. Gerek deste xwe zû bigirta. Yek ji vvan hişyar bibiya, edî tiştek nedihate kirine. Çû cem tekera mezin, li aliye dine. Ne nezîkî Şükriye. Xwe siparte vve. Desten wî diricifiyan. Deve eyare nifte vekir. Eyar di deste vvîde bû. Nift reşande tekere û erde havvîrdora vve. Bîhna nifte hate poze vvî. Işev hînî ve bîhne bubû. Xwe xar kir û nezî tekera dine bû. Nift rind rijande der û dore. Nava herdu te kera jî bîr nekir. Aliyek ku agir bigre, bira bigiheje aliye dine jî. Paşe, peş û paşiya traktöre jî tev xüas kir. Eyare vala kire paşila xwe. Dest da ser debanca xwe. Li Şûkrî niherî. Di xewede bû, qet deng je dernediket. Kî çi zane, peren ku Okeş axa vve bide vvî, di xewna xwede di dît. Kibrît vexist, di nav kefa deste xwede girt. Nezîkî erde bi nifte şil bûyî kir. Erde zûtire agir negirt. Ev çend saniye, ji bo Elî gelekî direj kişandin. Niha agir girtibû. Bele agir, bi dile wî girtiye ana. Dît ku agir hedî hedî peşve diçe, bavver kir ku edî danamire, xwe xûz kir, bi şûnve vekişiya. Şûkrî hela he hişyar nebûbû. Elî lez û bez dûr ket. Direviya. Paşve nedinherî û direviya. Qet tu kes berve wî nedihat. Kesî banî

69

vvî nedikir. Kesî evv nedîtibû. Westiya bû, le mînanî teyrekî sivik bû. Ji evv reyen ku bere hatibû, derbas bû. Vegeriya, hela he berbang nebûyî hate gund. Hinek li ser xaniyan, ber deriyan şevvata traktöre meze dikirin. Hedî hedî diçûne malen xwe. Xwe bi kesî nîşan nedayî çû ma la xale xwe. Xalojina wî li ber derî disekinî. Evv hemez kir. Elîbire hun dir. Alîkarî kir ku vvan kincen bi bîhna nifte bi guhire. Xale wî he ji nav gund nehatibû. Evv jî li derve, çav û guhen xwe vekirî li bende Elî bû. Elî meraq dikir, gelo tiştek nehate serî?

Diya te hat û pirsa te kir. Tu neçûyî mal. Feqîre dilteng bûye.
Min got ku tu bi xale xwereyî. Min şîret kir ku li te negere û zimane xwe bigre. Paşe evv çû. Li kederebe jî vve niha be vira.
Agire ku Elî berdabû traktöre, girtibû. Agir, alav pe ketibû. Bi şevvat û germa alavan, Şûkrî hişyar bû. Nişkeva xwe şaş kir.
Lo. Lo, agir... Şevvitandin...
Bi aliye hevalen xwede qîriya. Xidir, şoföre ku nû hatibû, Eso û He sen reviyan derve. Evv lastiken mezin agir girtibûn, bîhneke giran bi ser ketibû. Şûkrî mînanî dîna, bi alîkariya cileke dbcvvast ku agir vemirîne. Nedibû. Xidir qîriya:
Bîdonen mazote... Bîdonen mazote! Bira agir naveje vvir.
Bîdonen devgirtî, yen ku qet nehatine şuxulandine, girtin. Kaş ki rin ku ji eðir dûr bixin. Paşe li erde tot kirin, birin dûre. Bi xwe jî niha li cem tişten xwe bûn. Tiştekî ku bikin tunebû. Li traktora dişevvitî me ze dikirin.
Eva be namûsiye. Be dîn û be îmaniye. Tolazen benamûs, got şoföre nû hatî.
Gelo ke kir? Ke şevvitand?
Kî zane. Wekîşeytanane. Traktora merik, bi bîst penc û sî hezarî şevvitandin. Bo çi dişevvitînin? Qet xwede qebûl dike? got Xidir.
Eso û Hesen te digot ku cemidîne. Ker û lal, ji tirsan çilmisî, li hev dû dinherîn. Traktora terikîbişevvitîne... Çi cesaret? Nikaribûn ji hevdûre bejin, le bele di dilen xwede herdu jî hinekî kefxweş dibûn.
Li gund deng bilind bû, dihate bihîstine. Evv herdu cendirmen li mala axe, bi qîrîn û hevvaran hişyar bûn. Di desten vvande tivingen vvan, bi küre axe ye mezinve reviyan û hatin. Niha berbange diavet, ronayî dest pe dikir. Dûre, piştî vvan Ûsiv axa hat. Qefesa wî mînanî korikeke diçû û dihat. Hela he ji traktöre agir bilind dibû. Evv alaven gur tü

ne bûn, le dîsa jî hedî hedî dişevvitî. Bîhneka ncxweş ji lastiken şevvitî dihatin. Dû qûloz dibû. Li peş eðir hemû nezî hev bûn. Ji hev dipirsiyan ku çavva bûye? Kesekî tiştekî bi aqil nikaribû beje. Şûkrî, dev û le-
70
ven wî ziha û çümisîbû. Diçû cem axe, paşe cem cendirman û şoföre nûhatî. Gelo vvan dizanîbû ku Şûkrî xewede mabû? Xweşaşkirina vvî ya peşîn derbas bû, axe je pirsî:
Hela le... Hela... Evqas meriv, li traktoreke xwayî nebûn. Nikarîbûn biparezin. Dibe ku hûn ketibûn xewe?
Hemû raza bûn, levvra kesî nikaribû ye dine gunehkar bike. Di tariya şevede xwastine ku eðir vemirînin, lewra jî li kesî negeriyane. Paşe agir bi hemû traktöre ketibû. Damirandin zehmet bû.
Cendirme û yen dine hema usa didane çeran. Taqeta çöken axe tü ne bû ku here gund. We ji Okeşre çi bigota? Li ser kevirekî rûnişt, li şevvata tekeran meze kir. Serma nedikir. Sibe bû edî. Tariya sere çiya çû, edî ronahî hatibû devvse. Dine hişyar dibû. JI dûrve denge ave di hat.
Hemû bi hevre hatine gund, niha her der betir ronahîbû. Çend gun dî hatine ber dere axe, xwastibûn ku sencvveşiye bidine. Xwastin bejin ku haya tu gundîkî jî ji vî karî tunebû. Evv cîran bûn, cîrantiyede malşevvitandin,
canstendin nedibû. Ev makîna bedev, beziman vve cima
bi şevvitandina? Levvra, vvan tişten avvha nedikirin. Xwastin ku ve ye ke bejin. Ûsiv axa bi hers, vvestiyayî, hişe wî ne li serî bû. Ku gundî dî tin:
Hûn çi diðerin? Çi diðerin? Be namûsno, We mala min şevvitand.
Agir berda traktöre. Hûn li ber dere min çi diðerin?
Axa, bavver bike, qet haya me yekî jî tüne. Em benamûsiya vve

ha nakin.
Lavvo, vve neşevvitand, ke şevvitand? Ma şeyten şevvitand? Ere? Cinan şevvitand? Biteysin herin, bira çaven min vve nebîne. Dizen mî na vve, kuçiken mîna vve...
Gundî dûr ketin. Axa û yen li dore, çûn hundir. Xeber nedida, te digot ku deve wî hatibû giredan. Cbcare li ser hev dikişand.
Gundî tenegihîştin ku ke şevvitand. Çavva kiribûn ev kare ha? Nîve şeve, li ser xebera şevvata traktöre hevdu hişyar kiribûn. Gund gişt jî li ser xaniyan, li ber deriyan, li şevvata traktöre meze dikirin. Hemû hebûn. Qet kemasî tunebû. Soro jî, Mîro jî û yen dine jî. Hemû kes li vvir bûn niha. Gundiyen ku ji hevdu şik dikirin, bi çavan li hevdu digeriyan. Piştî ku hevdu didîtin, sika vvan nedima. Ev çi kar bû? Ke kiri bû? Gundî hemû li vir bûn. Di dilen xwe de, "desten kirî neeşin" digo tin. Çavva jî rind şevvitîbû. "Me di de û jina teno, ma cîkî dine nemabû, tu hatîbûyî bela sere me, sere me bbcvvi', digotin.
71
-XVIOumandare
cendirma, makîna nivîsandine di destde, bi şeş cendirmanveji cîpe peya bûn. Oumandar bi telefone qaymeqam agahdar ki ribû. Evv li vvîlayete, di civînekede bû. Ev xebera reş gîhîştibû Okeş jî. Ûsiv axa dest pe kir, bûyer ji qumandarre got. Traktör bi şev hati bû şevvitandine. Kesî bi çavan nedîtibû. Le gundiyan şevvitandibû. Se, çar nobedaren qasî keran nikaribûn traktoreke biparezin. Li hembe rî gundiyan be abur bûbû. We ji Okeşre çi bigota? Ha te avvha kiriye, an jî te li peş çaven wî de û jina wî nizam çi kiriye. Çi ferq dike?
Ez kuştim qumandar, van ez kuştim. Tu nizanî, tişte avvha care ke ku dest pe kir, kes nikare peşiye le bigire. We sibe ben mala min

bişevvitînin. We min jî bikujin. Neynûke vvan bira cî negire. Çaven meriyan
derdbcin. Küren keran, wisa şevvitandine ku kes nizane ke kiri
ye-
Ez dizanim eze çi bikim. Tu bîhna xwe fireh bigre. Eze niha giştikan
yek yek derxim. Te bibînî. We çavva vvek bilbilan xeber bidin.
Te evv nobedaren beteşe ji ku hanîn axa? Li cem vvan agir berdidine
traktöre, le yek jî pe nahese. Ma vvan bi xwe agir bernedabin? Ezjî bavver
nakim, le bele meriv awqasî jî hişkem nabe.
Na qumandar, na. Ev karen van gundiyen be însafýn. Min çend
meriven xwe ji binve şand. Tiştek hîn nebûn. Kes nizane ke kiriye. Kü
re kûçikan wisa bi fel kirine, ku wisa dibe.
Kesen ku tu le şike dikî hene? Wan ji minre beje. Bere peşîn ji
vvan dest pe bikim. Ez derseke wisa bidim vvan ku heta hete kes ji bîr
neke. Kes edî dîntiye neke, di ciye xwede bisekine.
Ûsiv axa heft, heyşt nav dane. Soro û Mîro jî di nav vvande bûn. No
bedar Şûkrî, yen dine jî dîtinen xwe gotin. Tiştekî wisa ku bi kerî me
riv be, tunebûn di navde.
Paşe nav bi nav gazî gundiyan kir, li cem hev da sekinandine. Cen
dirmen bi tiving dora vvan girt. Qîz, jin û zaren gund ji dûrve meze di
kirin. Gelo vve çi be sere gundiyen vvan? Çend jin, desten vvan di paşi
la vvande, zaroken dest bi peşen diyen xwe girtî, bi hevre digiriyan. Bi
qedeý a xwe, bi rojen reş ku li benda vvan bûn, digiriyan.
Sere peşiyede mele gund disekinî. Oumandar nikaribû di ciye xwede
bisekine, xwe bigre, sebir bike. Yek du rind bikuta û lexista, vve rehet
bikira. Ev karen vvî, di van salen dûr û direjde, qumandar kiribû
72
vî halî. Hersa wî ku dihat, dida çeran, bi pîhn û kulman ledbdst, paşe

hedî hedî mînanî pelen behre hersa wî vedimirî. Niha jî wisa dibû. Le, vve hemû gundiyan çavva bide ber dar û sîlan?
Mele, tu ji ber van rûyen xwe jî şerm nakî? Ere, qet fedî nakî? Cîranen te male xelqe didizin û traktora wî dişevvitînin, tu jî bedeng dimini? Ka beje, tu çi dizanî? Bîrve neke ha, ehle xwede derevvan na kin.
Welle û bille, bi nave xwedeye mezinbe, haya min ji tiştekî tüne.
Min qet tiştek nebîhîstiye. Wexta ez rabûm ji bo nimeja sibe, bi deng û hevvara gundiyan derketim derve. We çaxe min jî agir û şevvata trak töre dît.
Qet tu nabejî ku ma tişten avvha di dîn û îmanede hene? Ez bi dîne melaye mîna te ....
Bege min, destavetina male xelqe neheqiye, diziye. Bira xwede desten vvan bişkene. Ûsiv axa jî dizane. Ez van her roj çend caran ji cîrananre dibejim. Kî guh dide? Devvr ne devvra bereye, ez benî. Wisa xuya dikir ku mele dbcvvast direj bike, le qumandar bi denge xweyî bilind şoren mela di devde hişt.
Beşe, bibire. Tu vvede here.
Oumandar, aliye vala nîşanî mele da. Mele, dest li peş, bi lez xwe da wî alî. Paşe qumandar ji gundiyan yek yek dipirsiya. "Ke şevvitand? Haya te heye?" Bersiven gundiyan hemû vvek hev û kurt bûn.
Na xer. Nizanim. Haya min tüne.
Waxta ku ev bersîvan dibihîst, cinen wî dihatine serî. An mistek li nav çavan dbrist, an jî pînek li qûne dida. Hersa wî pir je bihata, du se caran zedetir ledbcist. Gundî razîbûn bi çend kulm û pînan. Çi bikira na? Çi ji desten vvan dihat, xenji razîbûne? Bi vî avvayî xilas bibûna baş bû. Jin û zaran ji dûrve li vvan dinherîn.
Olo, haya te tüne, ya wî tüne, ya ye dine tüne. Ma min hat trak

tör şevvitand, digot qumandar bi hers.
Dora Soro hatibû. Oumandar xwast ku duçar bike kirina xwe.
Soro:
Li min nexe bege min. Haya min tüne, got.
Çi, çi? Tu li peş min disekinî? Ere, tu peş berî min disekinî, ne?
Na xer, estaxfirla. Li hemberî te nasekinim.
Dbcvvast ku, evî çûr, evi sor rind bikute. Wisa lexe ku bira hîn bibe, vvekî li hember sekininadin çiye. Oerare xwe da. We evva bibira bajer. Li vvedere vve bi daran hûr xaş bikira. Ava wî derxista. Bira j i yen di-
73
nere bibe derseka giran. Dev û poze wî wisa hûr hûrî bikira ku kesî evva nas nekira. Bira bizanibûna ku davviya giştan vve avvha bibe. Oumandar edî dest ji kutan û lexistine berda. Nave vvan dinivîsî û dipirsî vvekî haya vvan heye an tüne û li peş nave vvan qeyd dikir. Soro nezîkî xwe girtibû. Nave hinekan jî ji axe hîn bûbû, evv jî anîne cem So ro. Careka din jî berve vvan zivirî.
Hûn dîsa jî nizanin, ne? Hela he nizanin?
Na xer, nizanin.
Em ji ku bizanibin?
Haya me tüne.
-XVIIOumandar
heft kes ji yen dine veqetandibû. Du bi du desten vvan
bi hevre gireda. Ye hefta, yekîbereng, jar û li ser piya düerizîbû. Ha le wî baş nebû. Yan yekî din jî bijbarta û pere gireda anjî evva aza bi kira. "Yekî mînanî miriyaye. Ev ne karekî başe", got di dile xwe de û peşberî wî sekinî qumandar. Xwe da ser lingekî, kulmek le xist. Ye di ne tiştekî wisa hevî nedikir. Li erde ket. Oumandar çend pîn dîsa ledan. Xar bû bi kulman li ruye wî xist. Her ledbcist, devvsa nermbûne

betir hersa wî dihat. Dîsa ledbcist. Dev û leven gundî tijî xwîn bûn. De here. Careka din jî tevî kare avvha bibe ku ez di diya te niza nim çi bikim.
Gundî nikaribû xwe li ser lingan bigre. Bi zehmetî şûnve çû. Niha hemûyan texmîn dikir ku çi vve be seren vvanen ku diçin bajer.
Di nav çar cendirmande, bi qîrîn û giriyen cîrananve gund terk ki rin. Yen digiriyan, dora qumandar girtibûn. Hinek diçûne lingan û hi nekan desten wî maç dikirin. Qet feyde tiştekî tunebû. Pir caran ha len avvha dîtibû. Nermbûn ne baş bû. Nikaribû kare xwe bibe serî, levv ra hişkbûn, riya herî rind bû. Hers bû qumandar û qîriya... Yen ku ne zî wî bûn, dehfand. Ji alîkî jî cendirman gundî dûr xistin. Hine jin û zar eşiyan, zare zara vvan bû, xwe şûnve kişandin. Deste Soro giredayî, bi jinanre hersa xwe hanî:
Hûn cima digrîn? Çiye, çi bûye? Ma mirine ev? Tu suce me he ye? Cima lava dikin û digrîn?
Hemûyan bedeng evv guhdarî kirin. Giştan xwe şûnve kişand. Çend kesan anî, pere dane gundiyen ku vve biçûna bajer. Oumandar ji her-
74
san sor bûbû. "Hela tu evî çûr binhere. Cima li min lava dikin. Şeyta nî çûr, eze niha nişanî te bidim. Lavakirina vvan, bi te giran te, ne?"
Çar cendirme û gundiyen giredayî tev ketine re. Oumandar û her du cendirmen dine bi cîpe, pey vvan ji gund derketin. Gundî, hela he nû ji gund derketibûn, çend zaroken vvan li pey ketin, paşe ji cendir man tirsiyan û zivirîn. Jinen vvan û cîranan li ser xaniyan, çaven vvan di rede, dûr û direj dinherîn. Gelo vve çi bibiya? Ji hevdû dipirsiyan. Mer, seren vvan di berde, aqîbeta cîranen xwene çûyî dihanîn ber çaven xwe. Oumandar nezîkî vvan bû. Jîp hedî hedî diçû. Sere xwe ji jîpe derxist: Dereng nemînîn. Zûtire bînin, got.

Oumandar hate mal. Qaymeqam ji vvîlayete telefon kiribû, yen bû yî hîn bûbû. Xwastibû ku davviye û her tiştî ji qumandar bibihîse. Walîjî pe hesya bû, gelekî li ser vî karî sekinîbû. Oumandar li qaymeqam geriya û her tişt jere qal kir. Heta niha nizanibû ku ke şevvitandiye. Le îşev çend gundiyan hevvekî bieşîne, vve her tiştî hîn bibiya.
Şîv xwar. Xwe direj kiribû, çay vedbcvvar. Hatin xeber dan ku gun dî anîne qereqole. Rabû, kincen xwe li xwe kir. Jina wî evv şîret kir ku di lexistin û kutanede zede nece. Tiştekî beteşe ji dest dernekeve. Evvî sere xwe ba kir, di dile vvîde çi hebû, eşkere bû.
Kete hundire qereqole. Aliye raste, li oda xwe, şewqe xwe darda kir. Li ser mase, ewraqen nûhatî niherî. Tiştekî giranbiha tunebûn. Gazî eskerekî kir. Çend daren zexm jere lazim bûn, evvana xwastin. Desten gundiyan vekirîbûn. Evv kirine odeke. Li ser deriye ode "nezaretxane"
nivîsîbû. Ode be pencere bû. Dîvvar, bi qireje belek belekî bûbûn. Deriye vve hesin bû. Di odede qet tiştek tunebû. Derî vedikirin û meriv diavetine hundir. Odeke ne mezin bû, le car cara bîst, sîh meriv tijî hundir dikirin. Oda mezin, cendirme tede radizan, li cem "nezaretxane" bû. Li aliye çepe odeke din, tişt tede dihate parastine, le car cara jî eziyet û lexistinen direj tede dihate kirin.
Oumandar nîşan da, ode vekirin. Mase dane alîkî. Ji bo vvan kursîke tene hebû. Du cendirmen zexm, ku îro nehatibûn gund, nevvestiyayî hilda cem xwe.
Bere, evvî çûr bînin vir.
Soro anîn. Gelekî vvestiyayîbû. Le, di çaven vvîde tirs nedihate xuyane. Her tişt dabû ber çaven xwe. Gelo dikaribû berxwe bide? Qerare xwe dabû. Tu carî lava nedikir. Mînanî hineken din nedigiriya, nediçû dest û piye vvî.

De beje. Te li gund negot, le te li vira bejî. Te motor şevvitand?
An ke şevvitand?
Haya min tüne. Bavver bike ku haya min tüne.
Bavverkirin. Ere, bavverkirin ha. Ji te bavverkirin. Çûro, çûroyî şeytan, ez bi te bavver bikim? Ji tere du deqîqe molet. An te mînanî meriya giştî bejî anjî ez dizanim bi te bidime gotine.
Bege min, vvelle haya min tüne, tiştekî nizanim. Deste xwe ji min vekşîne. Ez ji tere sond dbcvvim ku min tiştek nekiriye. Şeva traktör şevvitî, ez li nav gund bûm. Bi kemanî bîst meriv li cem min bûn. Dixvvazî, jî vvan gîştikan bipirse.
Evv jî mînanî tene. Çi ferqa vve heye? Tu ji vvan kûçiksanî, evv ji te. Emir da cendirman. Çarbcen wî dencistin. Soro avetin erde. Wî di rede kiribû hişe xwe. Heke ku lexin, vve li hember bisekiniya. Niha, nîve şeve, qereqol, awqas cendirme, tivingen vvan, vve çavva li peşberî vvan bisekiniya? Nikarîbû serederiye bike. Tivingek, devvsa feleqe şuxulandin. Lingen wî kirine nav qayîşen tivinge. Şewqe Soro kete alî kî. Herdû seren feleqe di desten cendirmande, lingen wî li hevva, qumandar
dar hilda. Dest bi lexistine kir.
Yek... du... se... Soro diranen xwe dişidand. Nedbcvvest ax, of bike. Oedereke şûnde lingen wî wisa dieşiyan, eşe diavete sere vvî. Piyen vvî vverimîn. Ji bin lingen wî xwîn dinuqutîn. Soro damîş nedibû. Çaven vvî reş û tarîbûn.
Oy daye. Oy eman. Way dimrim, got û xweve çû.
Denge wî hate birîne. Oumandar ji hersan lebû li erde keve. Westiya bû û diricifî. Ev xinzîre sor çiqasî jî li berxwe da. Hemû sekinîn. Oumandar li ser kursî rûnişt, dest bi cbcare kir. Soro avetibûn ser er

de şil. Di oda dinede, hevalen Soro, denge ledana daran ku dibihîstin, te digot ku li vvan bi xwe dixin. Ker û lal xwe sipartibûne hev. Him ji bo Soro li ber xwe diketin û him jî qedereke şûnde dora vvan vve biha ta.
Bi ava sar lingen wî şil kirin. Vedrokek tijî av kirin, paşe piyen vvî xistine. Ava sar bi enî; rû û pesîra wî reşandin.
Ciyen cendirme le radizan, gundîkî din hildabûn feleqe. Çavvîş 16-dbrist û qumandar meze dikir. Dar ku li lingen wî diketin, qîrîna wî di çû ezmana. Hersa qumandaf bi vî halî dihat. Bi potînen hişk, gundî da ber pîna.
Li oda dine, cendirmek li benda Soro bû. Soro hişyar bû, ferq kir ku her deren wî dieşin, lingen wî di vedrokedene û bi xwc ji serdape şile. Çaven wî dîsa hatin girtine û qulupîn.
76
Oumandar bi xwe hat, dest bi lexistine kir. Heta niha ev kesa nedîtibû, ne jî nas dikir. Qet dayîn û standina wî pere tunebû. Awqas kîn û hers ji ku dihat? Gelo, reng, bejn û bala wî le ne xweş dihat? An jî vvî ji gundiyen xwere, "lava nekin" gotibû, ji bo vve yeke diqehirî? Her çi dibe bira bibe. Le eva ne mînanî yen dine bû. Levvra dbcvvast lexe. Lexe, dîsa lexe. Heta nîve Şeve kişand. Oumandar hek keland û kir binçengen vvan. Bi kulman, be hemdî xwe, poz, dev, lev nedigot û ledida. Cîkî Soro ye sax nemabû. Cbcare dane, le bele, tüyen wî nedigirtin. Awqasî U desten wî xistibûn ku tiliyen wî mînanî bilûran bûn. Cendirme hemû îşev bi vî karî mijûlbûn, nerazabûn. Serda jî dilteng bûbûn. "Awqas l&ristin û kutan jî nabe. Ev meriv kuştine, ya rastî." Oabloyen tazî, da desten çend gundiyan, paşe manyato kir qumandar. Elektrik ku di cane vvanre derbas dibû, feqîran quloz dibûn û li ser hev diketin. îşev, yen ku hate sere vvan, ya rastî j i mirine xirabtir

bû. Zilmeke giran bû. Xwede nede sere dijminan.
Hemû kirine nezaretxane dîsa. Nîve şeve, zûva derbas bûbû. Ou mandar çû mala xwe. Cendirme jî bi dil şikestî ketine ciyen xwe.
Mîro bi hale Soro damîş nedibû. Gelo nemire? Vî ciyîşil, tiştek tu nebû ku li ser rûnin. Bi vî hali nedibû. Cekete xwe derxist, da bin vvî. Sere wî da ser çoka xwe. Deste xwe dabû ser eniya vvî. Soro nîv xweve çûyîbû, li wî dinherî.
Doste çûr. Tu çi merî... Merxasî li ser tera herame, got di ber xwede.
Hemûyan hale hevdu dipirsiyan. Birin û vverimandin tişt nîn bûn.
Bira şikestok tunebûya. Tu cîkî kesî neşikestibû. Ev kîn û hersa qumandar ji ku dihat? Cima dbcvvast ku Soro bikuje. Hinekan got, li ser gotina axeye. Hinekan got, ev dükûlbûn ji qumandar bi xwe te. Heta sibe naliyan. Sibetire Soro hişyar bû. Her deren wî pir dieşiyan. Ou mandar qet tiştek jî hîn nebûbû.
Ewqas bexewmayîn, vvestandin ji bo çibû? îşev gelekî peşde biribû lexistin. Kutana avvha jî nabe. Le vvekî evv çûre mirdar bimiriya? Ke vve evv xelas bikira? Qet tiştekî baş nedikir. Paşe hate bîra vvî, caran di rojnamande hine nivîsandin derdiketin, hinekan xeber didan di der ice tişten avvhade. "Na, qereqol ciye parastineye, ciye gumana xelqeye." Bira bene vira, bibinin ku qereqol çiye.
Sibetire dîsa li qaymeqam geriya. Qaymeqam vve îro bihata, vvalî jî pere bû. Walî diçû cîkî dine, le dbcvvast ku saeteke duda li vir biseki ne. Gundiyen belengaz, yen di nezaretxanede hatine bîre. Le vvekî ye kî benamûs û qumandar hez nake, fesadiye bike. Ji vvalîre beje, evv jî
77
Okeş axa jî hatibû û traktora xwe biribû. Bi alîkariya çend gundiyan tişt û motora xwe li kamyone kiribû, ji gund dûr ketibû. Qet bi kesîre

nepeyivîbû. Şofer digot, vve motore bibin Entabe anjî Edene, bidine çekirine. Le wisa xuya bû ku gele peren wî vve biçûya. Dîsa digotin, ku Ûsiv axa ker û lal, bi kesîre deng nekiriye. Okeş axa dbcvvast ku beje, "evana gişt ji ruye tede bûn."
Li van gundan, di van rojande hemû gundî li pey cote xwene. Kes vala nasekine. Bi herdu destan di nav xwînedebin jî, dîsa dbcvvazin co te xwe bikin. Nexweşe vvan fedî dikin ku bejin, em dieşin anjî di nava nivînande bimînin. Li alîkî cot dikin, li aliye din jî tivdareke zivistane dikirin. Hişkkirina fekiyan, kemasiyen dine. Meriv nikare bisekine di van rojande. Piştî ve deme, gundî bîhna xwe distînin, der doren xwe meze dikin. Dîlan û davvet dest pe dikin. Kirîn û fýrotina xwe hemû anîne cî. Evven ku keçen xwe dane mer anjî yen ku lavven xwe zevvicandine,
piştî van rojan hevvekî bîhna xwe digrin. Jiyan dijvvare, be însafe. Derden nû dest pe dikin.
îsal li Tendureke ne kesî ter tama rojen xweş sitand, ne jî mîna be re bi şen û şahî emîş hişk kirin, savar kelandin. Kesî dîlan û davvet ne dikir. Bele, te digot ku xwede ev tişt ji vvanre qedexe kiriye. Kî dbcvvast bizevvice? Bi çi ruyî? Bi kîjan pereyi? Bi çi dilî? Dilen hemûya xwîn di giriyan. Evv günde bere çûye, gundekî be deng, nîvxalî maye li devvse. Dû li ser nîven malan quloz nedibû. Yen dijiyan jî bi nîvcan bûn.
Soro ji mirine filitîbû. Panzde bîst rojande hate ser xwe. Her dere vvî reş û sor bûbûn. Singe vvî, devvsa pînen qumandar, dieşiya. Bi bîhnsitandine
eş zede dibûn. Renge wî çilmisî, poze wî tûj dihate xuyane.
Li dora xwe nermik nermik, bekef dinherî. Kî ku hale wî bipirse:
Başim. îro hejî başim. Hûn çevvanin? We çi bibe? Eme ji vir ha
çi bikin? digot.

Dîsa jî gund û rojen li peş difikirî. Hevalen vviye din zûtire rabûne ser xwe. Yek diçû û yekî dine dihate cem. Piştî ve bûyere gundiyan ji Soro betir hez dikir û guh didane gotinen vvî. Jin û mer serî didane û jere xwarinen xweş dihanîn. Çûyîn û hatina gundiyan, jina wî gelekî dibcvveş dikir. Rojen peşîn pir tirsiya bû ku Soro vve bimire. Ji şerman, ji kesekîre tiştek negotibû. Xwarziye wî Elî, ji ber sere vvî, ji ber çöken vvî qet nediqetiya. Evvî şevvitandibû traktör, le xale vvîji berve hindik mabû bimre. Levvra li ber xwe diket.

Kesî tiştek neçandibû îsal. Saleka dine, kesî kulmek genim nikari bû hilde. Qet libek genim jî tunebû ji parre. Ev belengazen îsal betir belengaz û feqîr bûn. Tu kesî kincekî nû nekirî. Jin û keçan kevnen

79

xwe pîne dikirin. Çarken vvan kevn bûn. Her tişten vvan kem bû, ji ba jer yen nû nikaribûn bistînin. îsal ji tunebûne nikarîbûn heqe mele jî bidin. Evvî jî feqîrî kişand. Zanibû ku di deste gundiyande tiştek tune bû, hebûya we heqe wî bidane. Di desten vvande tunebe, vve ji ku bi hanîna û bidana vvî. Kare mela jî ne baş bû.

Piştî şevvitandina traktöre, kare Hesen û Eso jî xirab bû. Heviya vvan bi cî nehat, nikaribûn li ruye gundiyan jî binherin.

Be çaretiye çend mal dîsa ji gund qetand. Penc şeş mal, vvan hale Soro dîtibûn, bîr û bavveriyen xwe bi tevayî vvinda kiribûn. Di nava heftekede,

melûl melûl ji qedera xwe dbceyidîn, çav bi hesir, gund û cîra nen xwe terk dikirin. Penc şeş xaniyen din dîsa be dû diman edî.

Okeş axa, "careka din nazivirime gund" gotibû. Traktora vviya nû şevvitîbû. Çekirin û ji nüve şuxulandina vve wext dbcvvast. Xwestibû ku Ûsiv axa zerara wî parveke. Ûsiv axa, "eme paşe bifikirin" gotibû, nexvvestibû

nezîkî tiştekî vvehabe. Okeşjî qet nepeyivîbû, qerare vene- geý andine dabû. Ji nîve zirare vegerîn jî baş bû. Ûsiv axa, qewle notere hanîbû bîra vvî. Okeş dîsa jî deve xwe venekiribû.

Li Tendureke bedengîke mînanî mirine hebû. Gundiyan tiştek neçandibûn,

le axe jî awqas negirtibû. Evv zeviyen ku nedabûne gun- diyan, vik û vala disekinîn. Zeviya mezin bi traktöre ajotibû, le tu cara tera mala axe nedikir.

We deme traktör he kem bûn li vvelet. Li Anadoliya navîn û roj ava, Entabe û Edene hebûn. Le li van deran ne zede bûn. Ji ciyen dine di hatin û li vir dişuxüîn. Xenji vvan ye axan hebûn, le bele ne pir bûn. Merivan qîmete traktoran nû fem dikir. Hûkûmate hedî hedî alîkarî dikir ku xwayî erd, traktoran bikirin.

Pey van bûyeran Ûsiv axa traktoreke nû nedît. Bi çend xwayî traktorre xeber dabû, le vvan jî davviya Okeş dîtibûn, kesî cesaret nedikir be. Ûsiv axa dîsa jî erd nedida gundiyan. Paşe çend gundiyen kal û pîr çûn û hatin. Xwestin ku axa hine zeviyen nû, ne baş be jî bide gundi yan, bira biçînin. Ji bo ve, axa bere pirs dabû. Bi vî avvayî, gundiyan ji axere zeviyen nû hazir bikirana, keviren vvan berev bikirana. Axa, kîn ge cane wî bbcvvaze, vve ji desten vvan bigirta. Gundî jî qet nebe, du se kod genim, vve xwarina zar û zeçen xwe hildana. Ne gundî ne jî axa bi vî karî düşad bûbûn. Le bele reke dine tunebû. Aliyekî dbcvvest ku ji birçîna nemirin, aliye dine jî dbcvvast ku zeviyen nû bi dest xe. Hinek kal û pîr, hinek zaroken jar mirin. Xenji van, tiştekî mezin nebû li gund. Gundî li ber karen giran perişan bûbûn. Çiqasî jî bi zeh met bû... Gayen vvan di nav deh rojande jar bûbûn û nikarîbûn cot bi-

80

kşînin. Jinan, zaran, pîran gişta, hema usa kevren zeviyan berhev di

kirin. Dest û piyen vvan qelişîbûn, tiş tişî bûn. Mînanî takî zirav bû bûn hemû. Her kesî evaran bi zûtire xwe dihavet nav nivînan. Hinek rûn li birînen dest û piyen xwe didan. Heke ku firset bidîtana, bihata na cem hev, qala rojen peş dikirin. Rojen dijvvar li peşiya vvan bûn. Di van demen behevîde, Soro û Mîro bavverî dida gundiyan. Cîran jî edî vvekî vvan herduyan dipeyiviyan.
Hûne bibinin. Em erde xwe nadine. Evvî neda me em bbcvvin, le bixwe jî tiştek nexwar. Destvala ma evvjî. Awqas par ji me distand be re, niha ji vve jî bû.
Em naçin. Eme bi kude herin? Ye vve waxte çavva bike?
Le, le. Em naçin. Le bele neçûyîn tere nake... Gerek meriv ze viyan nede wî ku qîmete neçûyine hebe. Heke tu di mala xwede rûniştibî, evv jî zeviyan dajo û diçîne. Çi xera gund heye vve deme? Neçûyina avvha, axa jî dbcvvaze.
Hinekan:
Van zeviyen nû bi me dide vekirine, vve paşe ji desten me bigre, berî me bide.
We berî me bide le, te çi bavver dikir?
Em awqas derd dikşînin, baro çi bikin bikin di davviyede nedine vvî, digotin. Hemûyan kem û zede tiştek reşand û çand. Axa zeviya me zin û direj tene çand. Xulam û küren wî tere kirin.
Erzihala ku şandibûne Enqere, dîsa şûnve vegeriyabû cem qaymeqam. Qaymeqam jî, ji cendirme qumandarî û katibe xwere şandibû.
Bersiven vvana xwend. Niha her tiştî he baş fem dikir. Tiştekî ku qaymeqam
bike edî tunebû. Hemû hatibûn cî. Erzihal çû di dosyede ciye xwe girt.
-XVIIIJi

Tendureke vvede günde Oesroke heye. Li wî gundî Zubed axa di mine. Zubed axa berbi kalbûneye. Ji piçûktiya xwede cbcare kişandiye û niha jî dikuxe û pir bebcem daveje. Xenji ve be derde. Hal û wexte vvî di cîdeye. Kurekî xwe dişine dibistane, dide xwendine. Qesrok gündeki piçûke, sîh mal tede hene. Hemû di ber emre axe xwedene. Zubed axa û bave wî Resul di sere Şex Seîdde, li cem Şex cî digrin û alî wî dikin. Kînge qala vvan rojan bihata kirine, salen yekî bihata pir-

81

sîne, gişta "sala Şex" digotin, ji we sale re. Oesrokî jî wisa dibejin. Pi ştî sere Sex Seîd hate şikestin, pey mahkemeke kurt li Diyarbekre, qerara dardekirine dane Resul axe. Li ber sûren Diyarbekire darde ki ribûn Resul axa.

Gelek ji gundiyen ku bi Resul axare bûn, miribûn, hinek jî revîbûn. We deme kesî nevverîbû li kesî bipirse. Kes li miriye axe xwedî derneketibû.

Qal dikin, vvekî hemû tirsiyane ku vvîbipirsin. We çaxe küre vvî Zubed jî di serde bû. Şer vvinda kiribûn, bave wî hatibû girtine. Zubed revîbû, xwe dabû hidûde Suriye, biniya xete. Derbasî vvira bûbû. Di vvan salande frensiz li Suriye bûn, vvan li vvir hikim dikir. Erd, kar da ne hineken nûhatî. Çiqas ji desten vvan be, alîkarî kiribûn. Dîsa jî ge lek damîşî germa Suriye nebûbûn. Be kar mabûn, feqîrî kişandibûn. Gelek ji vvan li Suriye mirin. Li biniya xete erd dabûne Zûbeyd. Ji ze vî û kar awqas fem nedikir. Bave wî jî darde kiribûn. Jin, zaren vvî, di ya wî nav xelqede, kî zane çi dikişand? Nikaribû xwe bide ser kar û bare xwe. Dbcvvest ku bi şûnde vegere.

Evv xebercn ku ji Tirkiye dihatin, mînanî bere ne xirab bûn. Se sal derbas bûbû, edî kes darde nedikirin. Cendirman diavete ser gundan, zordestî dikirin. Yen devvlemend, rişvvet didan û difilitîn. Xeber he

mû ne vvek hev bûn, Le bele hemûyan digot ku xeniqandin edî tune bû. Axa û meriven vvan şandibûne rojava Tirkiye. Sal derbas dibûn. Di van rojande gotinek di nava xelqede bû, "yen ku çûne rojava vve şûn ve ben, hukumat vve vvan bibaxşîne. Yen ku bene li ser erd û male xwe, ber emre hûkûmate bijîn, kes dest nade vvan."
Ji mala Zubed yen mayî şandibûn Edirne. Li vve dere diya wî da mîş nebûbû, miribû. Hineken dine nexweş ketibûn. Hinek zer dizîkave bi xwere biribûn. Zer ku xüas bûn, edî jiyan zehmet bû. Li Edirne erd, tera vvan bax û baxçe dabûne. Le nikaribûn hînî vvira bibin. Ziman û edeten vvan nizanibûn, tu cara li vvir jiyan hesan nebû.
Zubed li Suriye, ji mala xwe be xeber bû. Li gund çend mal mabûn. Wan pirs û sûvval kiribûn, ciye axe xwe hîn bûbûn. Alîkarî kiribûn. Xeber şandibûn ji axe nûre, li Suriye. Rind zanibûn ku axa gelekî di meraqedeye, le bele hukumat wisa be însaf û be merhemed bû, kesî nevveribû ku deng bike. Gotin rast derketin. Piştî çend salan, yen çûyî şûnve hatin. Hineken ku xwestin li rojava bijîn, hînî vvan deran bûbûn, nehatin, man li vvan deran. Le yen ku man, pir kem bûn.
Zubed bihîst ku mala wî vegeriyaye, ji binve xeber şand. Hinek çûn û hatin. Xeter tunebû edî. Zubed hat û çû, xwe teslîmî hukumate kir. Dîsa jî ji bo xilasbûne gelek peren wî çûn. Pir rojen bi tirs derbas kir.
82
Di davviyede her tişt kete re û baş bû. Yen ku kişandibûn edî çûn. Dî sa jî qeymeqam, cendirme û dairen dine bi çevekî baş le nedinherîn. Her tim di şikede bûn. Zubed ev gişt rind zanibûn.
Zubed axa, Ûsiv axaye tendûrekî, ji vvan rojen bereve hez nedikir. Dijmine hev bûn. Ûsiv axa jî, bave wî jî alîkariya hukumate kiribûn û li vvan xistibûn. Riyen vvan girtibûn. Gelek caran, miroven Ûsiv axa di nav çiyande reyen dizî nîşanî eskeran dabûn. Di davviyede Ûsiv axa

vvan jî xelas nebûn, le bele careke xwîn ketibû nav vvan. Li cem huku mate, Ûsiv axa her tim fesadiya Zubed axa dikir, digot ku:
Ev Zubed axa jî, bave wî jî li hemberî hukumate ser hildane û xayinin... Ev fesad, fýrsete bibinin vve dîsa li hember hukumate derkevin. Gerek meriv vvan biperçiqîne. Pişta maran rast bû, je bitirse, vve li te xe.
Ji ber ku Oesrok piçûk bû, tendurekiyan zirar didane günde vvan. Zevî, çayiren vvan didane çerandine. Tu rehetiya vvan tunebû ji deste Ûsiv axa û tendurekiyan. Zubed axa yekî hişyar û çavvekirî bû. Her tim mînanî mûye ku ji nav rûn te kişandin, bi hesanî difýlitî. Herdu axa û gundiyen vvan, bi hevre xeber nedidan. Te digot, heyvvanen vvan jî nayen cem hev, hevdu bîhn nakin.
Nepakî û pevçûn ku kete nav Ûsiv axa û tendurekiyan, Zubed ge lekî şa bû. Ji dest bihata, vve alîkariya gundiyan bikira. Bihata bihîstine, vve vve çaxe rezîl bibiya. Ne baş dibû. Ya rastî ji dûrve mezekirin bû.
Piştî qedereke, bi van bûyeren Tendureke, Zubed jîbekef bû. Wexta ku li Suriye bû, dîtibû, bihîstibû ku gundî li hemberî axan derdikevin, erde vvan ji deste vvan digrin û vvan dikujin. Heke li gündeki vî ti ştî bibin serî, paşe li günden der û doran jî vve dest pe bikin. Mînanî garisen ku li ser eðir dihatin teqandin, li pey hev dihatin. Peşî li bûyeran girtin edî zehmet bû. Li vve dere dîtibû ku axa û beg alîkariya hev dikin. Tiştekî avvha li gundekî bibiya, hemû bi hevre peşî le digirtin. Nedihîştin ku li gundekî din jî bûyereke vveha biqewime. Agir he negirtî gerek be vemirandin. Gund û gundiyen wî dihatine bîra vvî. De ma ku kurm tekevin birîneke, evv birîn dbcure û kûr dibe. Cardin dbcure û kurm her zede dibin. Kurm ketibûn hundire Zubed axa. Pe aciz û dilteng dibû. Hedî hedî di dile vvîde dijminatiya Ûsiv axa kem dibû.

Cima ne vvisaye, ma evv jî neşandibûn rojava? Ma vvan jî rojen nexweş û zehmet nekişandibûn? Yen çûyi, edî çûbûn. Ma peşiyan negotibûn "Ye çû, nede dû". Gundiyan jî pir anîbûn sere Ûsiv axa. Traktora vvan şevvi- tandibûn, zerar dabûn. Meriv li yen ketî naxe. Pevvîste ku meriv
83
deste alîkariye direjî vvan bike. Mencasî eve. Ev fikir bi rojan di sere vvîde diçûn û dihatin. We çi bikira, çavva bikira? Paşe biryara xwe da. We ev şuxula ji Cemal axare, Cemal axaye Darebîre vekira, alîkariya vvî bbcvvesta. He li van deran, serhildana gundiyan berfýreh nebûbû, alav negirtibû, dbcvvast ku bi Ûsiv axare li hev vvere, alîkariya wî bike. Günde Darebiye nezîkî vvan bû. Li hespe xwe sivvar bû, be xeber çû mevaniya vvî.
Bi xer hatî. Li ser serî û herdu çavan hatî, Zubed axa.
Di nav xeredebî, küre min. Cemal axa ne li male?
Qaseke bere çû sere bende. "Eze serîkî bidime eş û bem", got.
Tu keremke, eme banî wî bikin.
Bere denge xwe nekir. "HetanîCemal be, gelo demeke rehetiyaxwe binhere, çavva dibû? Xwe jî dikaribû here sere bende. Herdu tene di navxwede xeberdin, baştir dibû. Le bele mevan dibe xwe giran bigrin. Hela yekî mîna Zubed axa avvha bike, kî dizane Cemal axa vve çi bihesibîne?"
Ya rastî jî evvî Cemal axa qet hez nedikir. Nîşanî hev nedidan, le bele di binde, dexesiya hev dikirin. Ji bo çi mezinan gotine, "sere du beranan di beroşekede nakele."
Bele, bira yek here, xebere bide. Hespe min nekişînine tevvle.
Yek ji vve le sivvarbe, bira ji Cemal axare bibe.
Na bege min. Em dikarin hespekî din jere bibin.
Na, na. Nabe. Hespe min ji Cemal axare bibin.

Solen xwe dencist, çû jore, li ser doşega raxistî rûnişt. Balgiyen bi lind li ber pala vvî... Meriven male yek yek hatin, xer hatin û kefxwaşî dane. Avdevv jere anîn. Vexwar, simbelen xwe bi pişta deste xwe paqij kir.
Bîstekî şûnde denge Cemal axa ji derve dihat. Denge wî hevvekî ziravbû mînanî denge jinan. Li rûye wî deqen xuriye hebûn. Bejna Ce mal axa yekî kin û zirav bû. Çaven wî dibiriqiyan. Kincen baş li xwe di kirin. Nava wî û memûren bajer pir xweş bû. Salen wî ne zede bûn, le bele gelekî bi aqil û vvekî şeyten bû.
Way, tu bi xer hatî. Ser sera hatî Zubed axa. Tu bi xer hatî.
Nav xeredebî. Xere bibînî Cemal axa. Tu dizanî, nava herdu gün den me nîv saetî nakişîne. Bîhna min jî teng bû. Min meze kir ku tu nayî, min got qet nebe ez bem.
Estaxfirla. Ez çavva nayem? Le te gelekî baş kiriye, bi hatina xwe. Ezjîbe sebir bûm, hetanî eş çûm. Tu ji vvir heta vir, !i ser sere min ha tî.
84
Virda, vveda xeberdan û çay vexwarin. Cemal axa xwast ku Zubed axa vve şeve li cem wî derbas bike. We seleqelî bbcvvarana. Zubed axa dûr û direj mayîn qebûl kir, le ji bo riya nîv saetî nexwast ku male te ne bihele. Derengbe jî, gerek biziviriya günde xwe. Qebûl kirin. Xeber-dan hate ser ev bûyeren Tendureke. Li cem vvan çend kesen din hebûn, Zubed nexwest bi peyive. Cemal ji bo şabûna dile Zubed: Kirinen Ûsiv axa hemû neheqîne. Ya rastî, neheqiyen mezinin.
Cima li cem me nabe tişten vvisa? Meriv bi gundiyen xwere qet avvha dike? Xwede jî qebûl nake, got.
Zubed axa xwest ku kurt xeber bide.
Bele vvisane, got.

Ma, evven dine çi jîr û bi xîret bûne. Ere, ne vvisane tu bi xwede? Bele wisa te xûyane.
Cemal axa dît ku Zubed axa li ser vî karî naxwaze zede xeber bide, qale tişten din kir. Demeke jî wisa peyîvîn.
Hez dikî em qaseke jî derkevin derve, herne ser ave? Bira hevva ode jî biguhure. Çavvabe eme seleqeliye bbcvvin. Bira evv jî tivdareke xwe bikin, got Zubed axa.
Bele, cîrane wî dbcvvast ku tene bimînin, bira xeberdanen vvan yen din nebihîsîn. Cemal axa ji meriven xwere, ji bo tivdareken seleqeliye teme kir. Herdu berjer ber bi eş çûn.
Zubed axa yek yek, bi zimanekî vekirî fikren xwe û karen vveha ça vva li Suriye bi çaven xwe dîtibû, ye ku tene sere Ûsiv axa, gişt gotin. Ev xetera li peşiya vvan hemûyan bû. îro ji bo Ûsiv axa, sibe Zubed û Cemal axa. Ne wisa bû? Ma tiştekî din hebû? Bi vî tehrî gelek tişt go tin. "Van gundiyen qûntazî, dibine bela sere meriyan. Hestiyen bave merivan ji göre derdbtin û heyfe je distînîin..." Qise dikir, çaven xwe li ser Cemal axa digerand, dîsa dest pe dikir.
Nepakiyen nav me, dijminatiye, bi hevre xebernedane gerek em ji nav xwe hilînin.
Ev gotinen wî car cara hatibû bîra Cemal axa jî. Niha betir rind fem dikir, kederen Zubed axa.
Levvra, ez fikirîm. Min got, bere ji doste xwe, Cemal axare be jim van. Hela ka evv çi dibeje? Ere tu çi dibejî? Çi difikirî?
Gotina te raste Zubed axa. Di ve dinya derevvînde, bi hevre başbûn ya herî başe. îca xweyî gund, xweyî erd alîkariya hev nekin, vve li peş van kuçikan beqedir û rezîl bibin. Ez jî fem dikim, le bele ji deste me çi te?
85

Cemal axa dbcvvast, ku Zubed axa bi xwe beje, ku dbcvvaze nezîkî
Ûsiv axa bibe, pere lihev vvere. Heta îro goşte hev dbcvvarin. Di dardakirina
bave vvîde, para Ûsiv axa vvan jî hebû. Meriv çavva dikare vvan
ji bîr bike? Ev çi benamûsîbû. Heyfa bave xwe ji bîr kiribû. Awqas kesan
jere digot "axa", hürmet dikir. Niha li ber çaven vvan, qedre xwe
dbdste penc peran. Cemal dbcvvast ku Zubed axa bi deste xwe, bi zi
mane xwe tekeve vî halî berûmet. Evv jî, bi dibcvveşî meze bike. Piçûkbûna
Zubed, rezîlbûna wî bi çaven xwe bibîne. Paşe vve alîkarî bikira.
Deste xwe direj bikira.
Dibejim ku gerek axen vî alî, em hemû dostbin. Bi hevre başbin.
Wekîem hevdû bbcvvin, ma cima xelq çaven me dernexin? Yen ku anî
ne sere Ûsiv axa, hela he hindikin jî.
Ere vvalle. Tu rast dibejî. Çavva teyr hevdu bernadin, bi hevre difýrin,
gerek em jî vvisabin. Gundî bibînin ku em gişt bi hevrene, qet yek
jî di dile xwede derbas nake ku li hemberî yekî me derkeve. Yen ku di
dile vvandene, nikarin zû zû eşkere bikin. Ev beaqüiya, beteşetiya na
ye bîra vvan vve çaxe.
Bele, rast dibejî biraye min. Ez bi xwe jî ve dibejim.
Raste. Bele raste. Merive çi bike niha? îro, sibe. Tu, ji minre vve
beje.
Zubed axa, ya li ser zimane xwe negot. Dbcvvast ku Cemal axa bi
xwe fem bike. Evv merivekî bi aqil bû. Çibûye îro, vveha befem û ehmaqiye
dike? Tiştekî nafikire. Wekî korane. Zubed dît ku evv fem na
ke, bi şerm û zehmet got:
Di van rojen tengasiyede, gerek em Ûsiv axa tene nehelin. Evvî

çend cara meriv şande cem min. Got, ez beme mala vvî, em li hev werin, her tiştî ji bîr bikin. Em bene mala vvî, bira bi vî tehrî min bibaxşîne. Kî çi dibeje bira beje, hema bira evv qebûl bike, digot. Her çare jî min qebûl nekir. Ji bo ku min bîr û bavveriya xwe bi wî nedihanî. Ni ha, tu, vvekî ku te qet bi minre xeber nedaye, bi vvîre bipeyîve û bişîne mala min. Ev xerabî jî bila ji nav me rabe. Paşe eme desten xwe bidi ne hev, van tolaziyan damirînin.
Gotinen xwe qedandibû. Le zanibû ku Cemal vî karî dizî nahele, vve bi Ûsiv axa bide fem kirine.
Eze van bînim cî, axa. Ser sere min. Him jî di nav du se rojande.
Tu ji min bbevveze. Le gundî û cîran? Gelo vve nebejin ku bave wî da dardekirine, dijmine wî bû, bi serde jî Zubed axa Ûsiv axa vvek bira hemez dike. Mînanî dost û birayen salan. We nebejin ku xwîna bave xwe li erde hişt?
86
Te digot ku bi xençer li dile Zubed axa xistibûn. Tirsa wî jî ev bû. Raste Cemal axa. Le min her tişt ji tere got. Ez û Ûsiv axa, em hevdu bbcvvin, xulamen duh na per ben, yek bi yek me ji gund denrin. Ma ev ne be aqüiye? Ya rastî, hundire min ji gundiyan teqiyaye. Min serhildana vvan li Suriye dîtiye. Xwede nîşanî kesî nede. Axan davejin derve. Ha jin û zaren axan, ha yen mirtiban. Cem vvan ferq nine. Wer bi teşaxuzin, wer bi teşaxuzin... Dîsa neyne bîra min. Bi şeref û jiyana axan düeyizîn. Kî çi dibeje bira beje. Devvra bere şûnve venagere, Ce mal axa. Wan jî mîna me derd kişandin. Hukumate evv jî şandine ro java. Berûmet bûn, belengaz bûn. Niha ji gundiyan ditirsim. Ya baş em li hev vverin. Ev ji minre jîjivvîrejî başe. Ya rastîji me giştanre ya herî bi xer, eve.
Zubed axa baş fem dikir, berî giştan Cemal axa tinazen xwe dike.

"Gundî û cîran vve çi bejin?" digot. Le bele berî hemûyan evv wisa di beje.
Her tişt xeberdan. Dizivirîne male edî. Piştî vî qerarî, edî berx di hate xwarine. Hatine male. Şifre hazir bû. Bejingek anîn, seleke tijî goşte qelî danîne ser. Goşten be rûn, wisa sor bûbûn, ku meriv qemîş ne dikir le binhere. Li dora goşt maste sîrkirî hebû. Nane sele, nerm û nûpijyayîbû. Dest bi xwarina qelye kirin.
-XIXWe
roje hemûyan bihîst ku dijminen de û bavan, yen ku dbcvvastin xwîna hevdû bbcvvin, li hev hatine. Axa û beðen vira gişt dibûne dost û bira. Di nava vvande edî av jî derbas nedibû. Dîsa herkesi zanibû ku sebebe ve li hevhatine serhildana gundiyane. Gundiyan baş fem dikir evbûyer. Dbcvvastin çaven hevdu derxin, de ûjine hevdu nizanim çi bi kin, ji bo ku gundiyen feqîr û belengaz biperçiqînin çavva jî dibin yek, tene cem hev. "Way xulî li sere me. Ji bo ku ve dine ji mere heram bi kin, me di tasek avde bixeniqînin, dijminen salan dibin yek..." Li hevhatina axan, gundî betir hişyar dikir, nezî hev dibûn.
"Çave yekî di erde ye dine ye... Her tim hevdû xwarine. îro li hev tene. Dibin yek. Em cîranen salanin. Di nava mede qet tiştek jî tüne. Dosten hevdune. Em cima nayen cem hev? Nabin yek? Ne zede erde me heye, ne jî male me ku em li ser şer bikin. Emen feqîr, yen ku er den vvan ji dest te standine, em cima hevdu hez nekin, dijmintiye bi hevre bikin? Tirba hevdu bikolin? Awqas be aqilî û dînîtî jî nabe."
87
Ji roja ku Kurdistan bûye Kurdistan, qaçaxen vve kem nebûn. Kem bûn, zede bûn, le bele her tim hebûn qaçax. Bere, ji bo ku hukumate re eskeriye nekin, revîne. Li ser zevîke, anjî ji bo tiştekî din li hevdu xistine. Lexistine çûne çiyan. Car caran ji ber cendirman revîne, bere

xwe dane vvan çiyayen bilind û ase. Hinek damîşî zilma axan nedane, vvan jî lexistine axa kuştine, anjî birîndar kirine, paşe dîsa bere dane çiyan.
Evv xelqe ji vvan günden çiyan, doste qaçaxanin. Qaçax di tengasiyede fişek, nan ji gundiyan distînin. Caran, dikarin nîve zivistane di
vvan gundande derbas bikin. Rojen bi xeter, xeber hildidan û zûtire direviyan
qaçax. Meriven vira, ji berede hînî tişten vveha bûne. Hinek
qaçax dibin doste axan. Axan diparezin. Axen ku bi hevre nebaşbin, betir dibine doste qaçaxan. Qaçax, pere, xwarine ji axan digrin, dikevin bin emre vvan. Hinek jî qet axan hez nakin, dijmine vvanin, dosten gundiyen feqîr, gundiyen çiyane. Naxwazin ku bela xwe di axa bidin. Le vvan jî hez nakin. Waxta cendirme zore bidine qaçaxan, zû hîn di bin ku sebeb kiye. Ji bin sere ke derketiye. We çaxe rehetiye je dibirin, belan tînine sere vvan. Ev qaçax, çend kes bi hevre, di bin mezintiya yekîji vvan û jehatîde dijîn. Bi nave wî merivîtene naskirine. Penc kes bûn cerda îbo. Bave îbo yekî feqîr bû. Erde vvan kem bû, tera ma la vvana nedikir. Xwe jî ne yekîjîr û xebatkar bû. Heke bidîta dbcvvar, ku bi dest nediket, ji qedera xwe re dida çera. Bi çeran zike wî ter ne dibû, vve çaxe ji der û doren xwe tişt didiziya. Zaren wî edî mezin bû bûn. Çar kur û keçeke wî di belengaziyede dijiyan. Ye herî mezin, îbrahîm, yekî nes bû. Li zaren gund dbcist û xwarinen vvan ji desten vvan digirt, dbcvvar. Gelek caran sere vvîşikestî anjî, çîkî wî birîndar dihate male. Li male haya kesî ji kesî tunebû. Her ku mezin bû, bi aqil dibû. Kare wî tunebû û be erd, be cot bû. Bi vî avvayî kurmen wî yen bere diliviyan. Careke dudan li gund, şer kiribû, ketibû qereqole. Gava şerek an diziyek dibû, nave îbo dihate bîra meriv. Gelekî xîret kiribû, le bele nikaribû xwe je xilas bike. Çûbû gundekî dine, li ba meriven

xwe bbcebite. Ji bo ku nave wî derketibû, li vvedere jî rûke germ nişan nedabûn. Kesîbi wî bavver nedikir. Çend mehan li vvir mabû. Herdu birayen wî yen piçûk, edî bilind û pişkûr bûn. Di xirabiyede deh car ji ibrahim peşde çûbûn. Gund ji deste vvan zare zar bû. Xwûşka vvan jî bi zexm û quwet bû, du meran bi zehmetî pe dikaribûn. Evv rind û bedevv bû. Li gund, keça herî bedevv evv bû. Ji bo xwedîkirina de û bave xwe, diçû ji cîrananre dbcebitî. Qet firset nedida ku kes bi çavekî din le binhere. Ji mezekirina herkesi zanibû çi di dile vvande derbaz dibe. Bi quweta xwe, xwe diparast. Rûken û bi zancvveş bû. Henek dikir, kilam digot di nava kare xwede. Şbcule du merivan dikaribû bi tena xwe bike. Gava yek hinek zede here, bi nepakî tiştekî beje, deh caran gi ran bersiva xwe je digirt. Rezîl û berûmet dikir ye gotî.
îbrahîm gelek ga, hesp, pezen devvlemendan didizî û dibir bajaren dine difrot. Çend cara jî hatibû girtine. Zilma li qereqola cendirman pe kirine û yen hatine sere vvî, bi rojan bigota dîsa jî nediqediya. Li günde vvan yekî devvletî ji deste vvan zare zar bû. Damîş nedabû û li bave îbrahîmî kal xistibû. îbrahîm jî bi şeva nîve şeve ketibû mala vvî, ka û gihaye wî şevvitandibû û evv jî wisa kiribû ku evv bi çend mehan nehatibû ser xwe. Sevikeke wî seqet mabû. Be şiv nikaribû bigeriya. Nikaribû deve xwe veke, pişta xwe rast bike. îbrahîm jîji gund dûr ket, jiyana xwe li çiyan derbas dikir edî. Hevalen wî digotin ku evv gelekî kîndar bû. Yen ku evv je biqehire û je hez neke, dikaribû wî bi desten xwe mînanî mirîşkan şerjeke, qet çaven xwe jî neqirpîne. Hersa wî ku dihat, eniya wî teng û biriyen wî nezî hev dibûn. Aliye raste poze vvî dilipitî. Ev bi vî tehrî bidîtana, kesî denge xwe nedikir. Ev xisyeten vvî, hevalen wî jî zanibûn. Çiya le hat. Li van gundan kesî pere xirabî ne dikir. Evvî jî tu cara zirar nedida kesî. Car cara, bi dizîkave diçû male. Heke ku di deste vvîde çend quruş hebûna, dida bave xwe. Niha nave

vvî baş bûbû, ne xirab bû vvekî bere. Çend hevalen wî pere bûn. Bi dor nöbet digirtin. Li çiye xwarin çedikirin. Carna jî nan û pener tene bi dest diket. Li van gundan, dosten ku kincen vvan bişon hebûn. Li Ten dureke xaltîke îbo hebû. Di piçûktiya xwede çend caran çûbû vvir. Paşe, çend salan bere careke dîsa serî dabû.
îbo bûyeren Tendureke bihîstibû. Xaltiya wî jîji gund bar kiribû, çûbû Qonyaye. Axa perçek erd ji vvanre zede dîtibû, evv jîji gund çûbûn. Ev ku dihatine bîra vvî, poze wî dilipitî, biriyen wî nezî hev dibûn.
Li çiye, ji nişkeve cendirme avetibû ser vvan. Ve çare xeber negirtibûn. Her tişt ji nişkeve bû. Li çiyakî ase bûn di nav hinek daren nizmde.
Li paşiye jî nevvaleke kûr hebû. Li nav vvan daran dora vvan girtibûn. Evv çiyayen dost, be deng, ji vvan dûr bûn niha; Desten vvan ji çi yan qetiya bûn. Sere di nav vvan û cendirmande mînanî sere du devvletan bû, hema sere xwe bilind bikirana gülle bi ser vvande dibarî. He ta evare kişand sere vvan. Westiyayî û birçî bûn. Bere, çend caran bi cendirmanve rastî hev hatibûn, du se gülle diteqiyan, cendirme nedihatin ser vvan. Wan jî bere xwe didane çiyan. Niha ne wisa bû. Mirina hev dbcvvastin. îbo bi dengekî nizm qerare xwe ji hevalen xwere got.
89
Di ve nevvala yale rastede, eme ber bi deste biçin. Xetere. Gün den deste, be îtbarin. Em ku li vir bimînin, fişenge me vve biqedin. Pist ji me girtine. Mînanî berxa ber kere, eme deste vvande bimînin. Eze gullan li vvan bireşînim, vve çaxe hûnjî bi aliye nevvale birevin. Xwe bavejin
erde. Paşe dest bi eðir bikin, eze bem bigehejim vve. Eme li ser hev çend cara vver bikin, xilas bibin.
Li aliye dine, di nav dar û qirşande dengek bilind bû.
Teslîmbin! Teslîmbin, dibejim. Meriv nikare ji ber qanûne xüasbe.

Hûn ku teslîmbin, vve ji vvere baş be.
Li ser vî dengî îbo gülle barande wî alî. Hevalen wî berve nevvale reviyan û xwe avetine erde.
Lavvo. Hûn dînîn? Teslîmbin, dibejimji vvere. Havvîrdora vve girtiye, hûn bifirin ezmana jî nikarin xüas bin.
Ve çare yen dine gülle reşandin. îbo reviya, çû cem vvan. Şer bi vî halî domkir. Paşe, îbo û cerda wî xwe havetibûn nav dar û meşeyen nevvale, xwe xilas kirin. Wexta ku di nezîkî gundanre derbas dibûn, xwe ditelandin. Le ji dile vvan nedihat ku pir nezî deste bibin. Dbcvvas tin, dîsa bi awakîxwe bigihînin çiyan. Günde xaltiya vvî, Tendûrek ha te bîra îbo. Nezîkî vve dere bûbûn. Pir vvestiya bûn, nikaribûn gaveke peşde bavejin. Fîşengen vvan jî kem bûn.
Ev giren nizm li peşiya vvan, ev kire piştî Tendureke bû. Xwastin ku şeve li vvir derbas bikin. Van deran baş nas nedikirin, le bele gelekî jî nezan nîn bûn. Xetereke gelekî mezin nedidîtin. îbo cîranen xaltiya xwe rind nas dikir. Bere, wexta dihate vir. bi vvanre baş bû. Xwast he re mala Mîro, cîrane xaltiya xwe. Ji bo xwe hinek nan, fişeng tivdarek bikin. We bîhna xwe bistandana. Xeber ji jore hildana. Ka li vvan de ran çi heye? Be çare bûn niha.
îbo di tariya şevede kete nava gund. Li cem mala xaltiya xwe, ma la Mîro, te digot bi deste xwe daniye, dît. Tiving bi xwere nehanîbû. Dabenca wî pere bû. Li deriye Mîro xist. Yekî pirsî:
Evvkiye?
Denge wî nas kir. Mîro bi xwe bû.
Ezim Mîro. Ezim. Xwarziya xaltiya Şilteme. îbome.
Mîro derî vekir, bi nîvcî. Çira ji teneke nezîk kir û derî bi tevayî vekir. Rûyen îbo direj bûn. Westiya bû. Bi şik û tirs li dora xwe dinherî.
Jina Mîro çay keland, Mîro bi deste xwe çay jere tijî kir. Nan, pener û

mast je re anîn. Xwar, zike xwe ter kir. Hedî hedî hişe wî hate serî û dest bi xeberdane kir. Mîro cbcarek direj kir. îbrahîm hilda û got:
90
Li çiye, em ketne tele. Em ve çare xelas bûn, careka din tu tişt bi me nabe.
Hevalen xwene li çöle, sere vvan û cendirman, xüasbûna nane vvan, kembûna fîşengen xwe qal kir.
Min nedbcvvast ku sere vve texim belaye. Hatina mina vira ne başe. Ma hezar derd û bela ne bes bû? Ez ji neçariye hatim. Min bibaxşîne.
De here lo, ev çi gotine? Li dine her tişt dibe. Meriv gerek kerî merivan be. Ma çibûye?
îbo dîsa dest pe kir. Her tişt bihîstibû. Li çiye bûn, le ev hemû bû yeren Tendureke hatibûn guhen vvan. Paşe pirsa Soro kir:
Min bihîst ku evv gelek aciz kirine. Ji mirine filitiye.
Mîro vve biçûya, xeber bida Soro jî. Paşe vve bi hevre mevane xwe revvî bikirana. Mîro ku derket, tirseke bi îbo girt. "Le teleke binine se re min." Qet îtbara meriya bi kesî dibe? Çend kesa vveha, mevane ma la xwe bcbar kiribûn, dabûn dest. Meriven ji ber qanûne direvin, tu ca ra gerek çavgirtî nebin. Şaşiyeke piçûkbe jî, qet meriyan nabaxşîne. Meriv jiyana xwe dide der. Nexwest tirsa xwe nişan bide. Jina Mîro û zaren wî li cem bûn. Gelo Mîro dikare dînitiyen vveha bike? Paşe ev tişt ji hişe xwe dûr xist.
Xwûşka min, bi vî axayîre sere vve di derd û belayedeye. Zivistan be şer, bedeng çû, le ditirsim ku pevçûyîn dîsa dest pe bike.
Bira, de xwede qebûl neke. Em jî şaş bûn ku çi bikin, çilo bikin. Belengazî, perîşanî li alîkî, em nizanin ku vve ji vir ha çi bibe.
Ve deme, derî hate lexistine. îbo be hemdî xwe dest havet dabenca

xwe. Eðer xayîntiyek be peşiye, vve bersiva vvan bida. Nedbcvvest badilhevva
be girtine.
Soro û Mîro ketin hundir. îbo ji fikren xwe fedî kir. Çi hatibû sere vvan, gişt peyivîn. Çiqas nane vvan herdu malan hebû, gişt hanîn. Pener û pîvaz dane ser, bi leçegeke sipî peçandin. Soro û Mîro, hinek fîşeng hanîn dane... Dibe ku rojeke bi kar bînin, zûve ji çerçîkî kirîbû Soro. Mevane xwe revvî kirin.
Piştî vve şeve, îbo betir hate guhartine. Betir bedeng bû. Li hembere neheqiye he jî tûj bû. Tevî her tiştî nedibû. Dbcvvast ku deyne hustiye xwe bîne cî, tiştekî bike ji bo tendurekiyan. Li kederebe jî guhe vvî li ser Tendureke bû. Li vvedere çi bibûya, zû dihate guhe îbo. Her tim ji hevalen xwere qala neheqiye, zorbetiye dikir. "Even ku zore dikin, gerek bene perçiqandine" digot.
91
-XXDine,
edî germ bû. Zivistane, feqîriye û belengaziye dest da bûn hev, gundî pir perişan kiribûn. Le niha hedî hedî dest vekişandibû zi vistane. Zarok li nav malan, ü derva düîstin. Lingen vvan xas, dora se re vvan kurkirî. Bi poren direjve morî, sterken hesinî zeliqandîbûn. Di davviya zivistanede, zaren jar û kal û pîr miribûn. Her sal di van mehande mirin zede dibû, le îsal hîn jî zede bûbû. Kalan henek dikirin, tirsa xwe ji van mehan ji hevdure digotin. Ka û gîha zû diqediya. Heyvvane jar ji bo devek gîha diçûne çöle, nevval û kortan.
Mirov jîndar bûbûn. Gelek kes dikeniyan niha. Ûsiv axa jî hate ser miriyen çend kalan. Gundiyan pere xeberdidan di van şînande. Ji bo hurmeta mirî, bi edet û tora gund. Le wisa jî bi germ û dostî nîn bû. "Merheba... Çevvanî?... Başî?..." Niha dinya vvan ne yek bû. Gundî bi

derd û kulen xwede bûn. Yek ji vvan nexweş bibiya, mal tijî cîran dibû û alîkariya hev dikirin. Derden vvan evv nezî hev dikirin. Xeberdan û kirinen kesî yen dine nedieşand, dostiyeke germ hebû di dile vvande. Kesîxwestina ye dine, şûnve venedigerand. Dianî cî. Hemû diçûne ser kare xwe, te digot ku qet tiştek nebûye li vî gundî. Dîsa hemûyan dizanibûn,
bi biharere derd vve dest pe bikin. Be dengiya zivistane, pevneçûyîn vveha nediçû. Axa vve bbcvvaze ku zeviyan bajo û biçine. Gun dî jî vve li hember bisekinin, şer vve di serîde, di ciye mayîde ji nüve dest pe bikira.
Bi baharan, germbûna dine û hevve, heşînbûna der û doran meriyan diguherîne. Meriv baştir difikire. Dbcvvaze her baş bijî. Cîran, jin û zaren meriyan, xweş dbcvveyin li ber çaven meriyan. Zimane kesan her xweş dibe. Evv xeberdanen tel û tûj, ciyen xwe didine pirsen şirîn û nerm. Belengazî, feqîriya zivistane zû ji bîr diçe. Qîrîn, lîstin û he nek. Jiyaneke nû li gund. Çiyan dest bi heşînbûne dikir. Berf radibû, gûlik derdiket. Heşnayiyeke bi belgen direje gûlik. Pir zû derdikeve û zû jî diçilmise. Gundî hemû, di vvan rojande rikefî gûlike dikin. Di beroşen mezinde, piçek rûn, dikelinin gûlike. Hemû mal bi kevçiyan dikevin ser. Meriv zû ter dibe. Le bele piştî qedereke kurt, tu dibejî ku te qet tiştek nexwariye. Birçî dibe meriv.
Berf dihelin, av radibin. Ji çiyan berve jer, ava berfe dike xuşe xuş û te. Ceme peşiya gund, di van rojande pir xetere. Gelek caran zarok tede dixeniqin.
92
Rojan dane pey hev û çûn. Rojeke, Ûsiv axa bi yekî ji Qeyseriye, xwayî traktör, bi traktoreke.mezinve derketin hatin gund. We evv ze viyen ku par nehatibûne ajotine, biajotana îsal.

Ûsiv axa bere xwast ku dîsa xebere bide gundiyan. Paşe poşman bû. Maren di xewede gerek neyen hişyar kirine. Ye ku ne di bîra vvande bû, gerek bi vvan neda hesandine. "Paşe vve bidana ber tirsa vvî, vve be la xwe tedana." Levvra ji kesîre negot, ku li ku û çavva dîtibû ev qeyseriyî û anîbû gund. Kesî nizanibû, bi çi qerarî tev hatine.
Li ber dere axe binhere, berdere axe. Traktoreke ji ya par, dîsa haniye.
Hela renge vve binhere. Ne ya parbe gelo? Çekiribin û dîsa hanîbin? Na lo, ne evve. Hişe xwaye we hebe, qet careke din jî te van aliyan?
Li ber deriyan, ji ser xaniyan li traktöre meze dikirin gundiyan. Ni ha li gund qedera şest malî hebûn. Yen çaven vvan baş nedidît, desten xwe didane ber eniya xwe, dûr û direj dîsa dinherîn. Ji cahilen dora xwe tiştin dipirsiyan.
Dîsa derd tene ber deriyen me.
Le te nizanibû? Zivistan hat, her tişt qediya, te wisa digot ne?
Hela em meze bikin, ve çare vve cane çend meriyan bişevvite?
Xilasbûn tüne bira. Hukumat alîkarî nake. Xwede jî mal û erd daye wana. Karen vvan di cîdeye.
Çaven vvan li ber dere mala axe bûn. Diçûn û dihatin. Gişt bi lez û bez bûn, bi kef dihatine xuyane. Tivdareken sibe dikirin... Kemasiyen xwe binine cî û sibe dest bi kare xwe bikin.
Gundiyen behevî, yek bi yek ji gund çûbûn. Yen kal hela he hebûn. Piraniya vvan tişten xeter nedbcvvastin. Axa dîsa jî mînanî her timî bi tivdarek bû. "Li bajer, evv meriven dayren hukumate gerek bihatana dîtine", bi hemûyanre xeber dabû. Nobedar, Eso û Hesen vve îsal dîsa parastina traktöre bikirana. Par tiştek neketibû desten vvan. Ma axa çi bikira? Ne sûce wî bû. Traktör ku be şevvitandine, axa çi bike? îsal ka re vvan vve baş bibiya.

Soro nexwastibû, le bele nikaribû vvan bide sekinandine. Hinek ji kalen gund çûne cem axe û pere xeberdan. Axa ji vvan re:
Min usa zanibû, ku hûn bi aqüin. Hûn jî tevî zar û xortan dibin, gotibû û hersa xwe anîbû.
Paşe jî xwastibû, hinekî bi dile vvan xeber bide.
93
Di cîrantiyede tişten vveha nabin. Min bbcvvasta, min dikaribû vve hemûyan ji gund bavejim, dendm. Min dîsa jî nekir. Yen vve rabûn traktör şevvitandin. Ev qet te kirine?
Paşe, him evv tirsandibûn him jî şîret li vvan kiribû.
Herin. Baqil, baqü kare xwe biniherin. Em hemû mînanî bere, bi hevre cîrantiye bikin. Ve çare vvek cara peşîn nabe. Zeviyen min dest lenedayî man. Min vveha nedüuşt, le heq û hûqûqe bav û kalan heye.
Soro û Mîro, li mala Soro ser kulavan rûniştibûn, cbcare dikişandin. Di ve sala davviyede, he betir bûbûn doste hev. Ji hev nediqetiyan. Mî ro ji Soro pir hez dikir, ji hemûyan pirtir qedir û qîmete wî digirt. Be deng, bi qerar û merivekî bi hemde xwe bû Soro. Li hemberî qumandar sekinîbû, piştî awqas lexistine, dîsa jî sere xwe li ber vvan nizm nekiribû. Pey vvan, edî Soro li ber çaven Mîro merivekî din bû. Yekî pir bi qedir bû. Merivekî mezin bû. Hinek aliye wî hebûn ku di kem kesande dihate xuyakirin. Bi tivdarek, bi aqil. Doste cîranen xwe bû.
Mîro, bi hers û esebî bû. Ve yeke jî pir zirar dida vvî. Bi Sorore hevaltiya vvî ku peşde çû, ev kemasiya xwe ferq kir. Mîro jî dbcvvast ku mînanî vvîbe, qasî ku ji deste wî dihat.
Jina Soro dbcvvast alîkariya vvan bike. Esmer, bi bedena xweve ge lekî li ser xwe bû. Pir bîr û bavveriya vve hebû ku mere vve ne neheqe. Soro, Mîro di nav xwede xeber didan, evve nîşanî vvan nedida, le ji bin

çavan, bi dibcvveşî li mere xwe dinherî. Qet xirabiya mere xwe nedîtibû, ne jî bihîstibû. Dizanibû ku mere vve je hez dike û bi xwe jî ji So rore wisa bû. Soro qet pirseke ne pak jere negotibû û lenexistibû. Li gundan, jinen ku meren vvan lenexin hene qet? Jinen gund dihatine cem hev, henek dikirin û jere digotin:
Keçe, reşoke! Tu çiqasî bi bextî? Soro rojeke li te naxe, nade xebera. Qîze tu çi diki bi vvî? Ji mere beje. Tiştekî dine ku em nizanin heye gelo? Dikeniyan.
Cbcaren xwe yen qalind dipeçandin, difýkirîn, vve çi bikin. Derî leket, xwarziye vvî, EÝî kete hundir. Yen çûbûn ba axe, axe çi tehrî şîret kiribûn, çaven vvana tirsandibû, yek bi yek qal kir.
Mîro:
Meriv nikare bi vana bide fem kirine, gelekî zehmete ya rastî.
Kafire Ûsiv qet te re, hey lolo? Ûsiv, vve diya xwe jî bifroşe, le ji zevi yan dest nakşîne.
Em çi bikin Mîro? Te vvana jî, wisa qebûl bikî. Merive avvha, çend caran bi çaven xwe nebinin, çend cara neye sere vvan, xisyeten
94
xwe terk nakin. Bere çavva hîn bûne, dbcvvazin dîsa vvüo bikin. Gerek meriv sebir bike. Par ceribandin, nebû. îsal dîsa ceribandin, nebû. Levvra ber xwe dikevin. "Hûn cima avvha dikin?" naye gotine. Sebir bi ke. Evve jî binherin ku reke dine tüne, vve berdin van kirinen xwe. Evv jî mînanî mene, tene perçiqandine. Lomaji axe lava dikin. Be çarene. Qet hersa xwe ji vvanre neynin, got Soro.
Ya rastî Mîro diqehirî. Car caran tûj û bi hers jî xeber dida. Elî ji hersan dîn dibû. Piçûk bû, levvra fikren xwe nedigot. Xwede kiribû ku piçûk bû. Yen di düe xwede nediavete derve. Ne wisa biya, xirabiyen mezin je bîter dibûn.

Tu dibejî sebir... Ha sebir. Başe. Merik traktör aniye, sibe dest pe dike. Ev diçin û lava dikin, li ber diðerin. Were, vveha neke dibejin. Lo qet çaven vvan ve traktora terikî, li ber derî nabînin?
Bele raste. Le dîsa jî ji beçaretiye. Tu hemûyan jî baş nas dikî.
Ma miroven xirabin evv? Na. Cima ne başbin? Taqeta vvana tere na ke, mînanî yen ku di behrede desten xwe bavejin mer. Loma lava di kin.
Elî şandine malen çend cîranan. "Sibe em gişt li ber sere zeviyen xwe bin. Mînanî par. Bi tivdarek û bira haya me ji hevdû hebe."
We ji gundiyan giştare bigotina. Li gund, mînanî Eso, Hesen, me riven axe, vve hîn bibana. Dibe xenji vvan hineken din jî hene. Şükriye nobedar, be îtbar bû. Mele, bere aliye axa girtibû, niha tevî tiştekî ne dibû. Xeber nedida. Çendekî dîsa rûniştin. Mîro bienijî.
Sibe kar pirin. Ez herim, got û rabû çû.
Jina Soro hate cem. Der û dor berev kir. Xwe nişan dida ku dbcvvast nezî wî bibe, pere hinek tiştan bipeyive. Mere xwe di xeterede didît, dbcvvast wî hemez bike, nede kesî. Nedbcvvast Soro ve bizanibe. Fedî dikir. Zarok di xewede bûn. Di xewnede, ji dine bexeber, li hespen xwe yen qamîşî sivvarin. Anjî li ser pere teyrekî difýrine, li ciyen ku he ta niha qet nedîtine. Soro li pe, nezî vve bû. Fem kir, jina wî dbcvvaze tiştekî bibeje. Te digot, ku herdu jî li benda hevdu bûn.
Dîsa tiştek neye sere te? Par, payize te çi kişand? Wekî tu nebî, eze çi bikim?
Ev ji ku derketin, ji ku hatin? Çi vve li min bibe?
Le. Le. Çi vve li te bibe... Ez nizanim cima? Cima tene li te xistin, tu ji mirine vegeriyayî. Cima yen dine wisa nekirin? Her tiştî ji te dizanin.
Soro keniya. Di dile xwede şa bû. Li ber çaven jina xwe, vveha bi qedir

û qîmetbûn kefa wî dianî. Wîjî nedbcvvast ku nîşanî vve bide.
95
Tu li vve deme meze neke. We çaxe wisa bû careke.
Jina wî çav bi hesiranve tijîbûn, rûye vve dibiriqiya. Xwe şaş kir, ni zanibû vve çi bike. Dest bi girîne kir. Soro desten we girtin. Bi dü û can desten vve di nav desten xwede givaşt. Niha li pe bûn. Soro çaven vve ziha dikir.
Te bibînî. Van derd û kulen ku em dikişinin, zaren me vve nejîn.
Eme belengazbin, le ji bo vvan vve baş bibe. Tu li tişten dine nenihere. Guh mede. Be derd qet tiştek naçe serî. Tu keviren zeviye berev nekî, avnedî, emeðe xwe nerijînî, te ji zeviye çi bigrî? Qet. Levvra hinek belengazî, zehmet, rojen teng, eme bijîn, le bele, davvî, bavver bike ku vve pir baş bibe. Te bibînî, îsal vve ji par baştirbe.
Deste xwe bir rûye vve, jina wî xwe sipartibû mere xwe. Dbcvvast ji vvî quwet û cesarete bigre. Firniken befile vve vedibûn û dihatine girtine. Çaven vve bi dilovaniye mij bûn. Çav û dilen vvan bi xwastina hev tijî, nivînen xwe raxistin û razan.
Rojtira dine, gundî hemû bi tivdarek bûn, gişta di dile xwede digot, "Xwede bike, ji zeviya min dest pe nekin. Le, vvekî nikaribim li hem berî axe û traktöre bisekinim. Le vvekî di xwede nebînim ku berî vvan bidim. Le zimane min be girtine. Şevvitîm çûm. Mirim çûm. Li peş he mû cîranan be abur û berûmet bûn, ji mirine xirabtire." Her tişt beguman dihate bîra vvan, le nedbcvvastin ji kesîre bejin û nişan bidin.
Ev xeber lezeke şûnde çûn ber guhen axe. Him jî ne bi gotina Eso û Hesen. Niha, he nebûyî, her tiştî dikaribû bibihîze. Him jî bi reke nû û pir fireqet. Eso û Hesen tevî dest û rûyen xwe nedabûn, le bele pir baş jî nebiribûn serî.
Axa ku ev bihîstin, merivekî xwe sivvar kir û şande bajer. Bi şefaqere

şeş cemdirme û ve çare, ne qumandar bi xwe, devvsa wî çavvîş hati bû. Rind şîret girtibûn. Gerek rû nede gundiyan, le nehele jî bûyeren mezin bibin, zeviyen Ûsiv axa bene ajotine. Qanûn, zagon gerek bi başî bi reve biçûya. Hemû kes çi be ber aqle vvan, gerek nekin.
Sibe zû gundiyan, cendirme li peş mala axe dîtin. "Ve sibe hatine. Duh tunebûn." Gelekan fem kir ku haya axe ji bereve bûye. Kesî neeciband.
Gişta eşkere xeber dabûne hev. Haya wî jî, vve bibe. Ma vve ni ha çi bikin?
Gundiyan, di dile vvande bavverî û hevî, gaven xwe dihavetin. Ge rek em bibine serî. Ev yeka ji xwe hevî dikirin. Rojen nû û şa, xwayî erd bûn di ber çaven vvanre derbas dibû. Bi vî bîr û bavveriye meşa vvan, gaven vvan bi tehrekîdin diçû. Betir zexm û jîr. Di nav van meşan-
96
de hinek jî şik hebû. Le vvekî nikaribim ji bin vî karî derkevim? Hevî û şik, tirs tevîhev...
Heta niha kînge pek anîn ku? Desten xwe avetibûne çi, hemû tişt di desten vvande mabûn. Levvra j i her tiştî diketine şike, behevîtiye. Ya rastî, pir caran, bavveriya xwe vvinda dikirin. Ditirsiyan ku lingen vvan li keviran keve. Qedera vvan wisa kiribû, ji her tiştî diketine şike. Bibi ne serî. Di dile vvande, bîr û bavverî dihatin û diçûn. Levvra, gaven xwe bi tirs diavetin. We baş nebe..We bi zehmetbe. Rojen teng û tarî vve ben. Her tim ji van ditirsiyan. We wexte, çöken vvan, lingen vvan şist û betaqet dibûn. Niha şik tevî heviyan bûbûn. Bavverî tevî tirsan bûn. Ditirsî,
heviya xwe vvinda dikî. Dikevî şike, paşe bi peyre tirs te dile te.
Hevî, tirs, be bavverî, şik... Tirs, hevî, şik...
Rojen dihatin, şepezetî û belengazî dihanî. Gelek vve perişan bibû

na. Dîsa jî ezman heşîn, dine kesk, çem û av jiyan tijî... Kulî, teyr, berx û giştîkan betir, peştir mirov... Çi dibe bira bibe, dîsa jîjiyan pir xweşe. Dine, dineke jiyaneye. Desten meriv ji jiyane venakişe. Axa çiqasî zil ine bike, traktör be emanbe û tirsa cendirman her giranbe, jiyan dîsa jî xweşe.

Hesene Hemzo xayîntiye bike, nîve gund sere xwe hildin herin, bi ta ketin, birçîbûn emana meriyan jî bibe, jiyan dîsa xweşe. Hemû kes jiyane hezdikin, levvra gundiyen ku diçûn zeviyen xwe, di dile xwede guman û hevî dibirin bi xwere. Le bele tirs û behevîtiye jî nikaribûn bi tevayî ji dile xwe bavejin. Heviyen rojen baş. Heviya hinek erd ku bi dest û tiliyen xwe bipişirînî. Tijî nava çarbcen te bibe. Qireja vve bi pirça singe te keve û xulya vve tevî pore te bibe. Piştî xermana, hatina ze viyen xwe, kesekîre parve nekî. Wek tiştekî ji can û bedena meriv bi zore diqetînin.

Bi emeðe xwe, keda xwe, bi tîş tişîbûyina desten xwe, bi neynûken xwe çend kod genim hildî, paşe bi axere parvekî... Çi mirine evv, çi mi rine. Tu vvere van ji tendurekiyan, ku bi tirs û hevî diçin ber zeviyen xwe, ji vvan bipirse.

Hinekan dev û leven xwe dikotiyan, hinekan jî cbcare li ser cbcara dikişand. Bi alîkariya cendirman, zevî vve bihatana ajotine, vve çi biki rana? Hey lo, çavva ev tişta bere nehatibû bîra vvan. We bi cendirmanre bi çi avvayî serederî bikirana? Qet tiştekî napirsin, didin ber dare tivingan.

Evv zeviyen ku par li ser şer û güî çebûn, dest pe kirin vvan bajon.

Bi parastina cendirman û xulamen axe, traktöre, tire tira vve bû, ji serîkî diçû seriye dine.

97

Xwaye zeviye, di dile xwede, gelekî eriş kir, di davviyede ji cîranan

fedî kir, çû li peşiya traktöre sekinî. Dest û müen xwe dihejand. Tiştin digotin, kesî fem nedikir. "Par ji rûye minde, ji bo ku zeviya min xilas bikin, cîran gişt hatin alîkariya min. Hinek cîranen min hatibûne lexistine, teda dîtibûn. Ez çavva dikarim bedeng bisekinim? Çavva ve kirina axe qebûl bikim?" got di dile xwede. Mejiye wî tevîhev bû. Her tişt ser û bin bû. Çaven wî edî tiştek nedidît. Ve sibe ku cendirme dîtibû, jina xwe bi xwere neanîbû. Nedbcvvast ku jina xwe tevî karen vveha bi ke. Bi xwe tene bû. Li peş traktöre diqîriya û tiştin digot. Gavek jî bi şûnve nediçû. Traktör sekinî. Cendirme û xulamen axe xwe gîhandine. Evvî hema usa dest û mile xwe dihejand û digot:
Ev der yen minin. Hûn nikarin bajon. Çi heqe vve heye?
Du cendirman evv dehfandin. Xwastin ku evv xwe bi şûnve bikişîne. Gundî di cîhe xwede sekinî, şûnve neçû. Li ser qûna xwe ket û erde ma. Çaven wî li hevvîrdora wî bûn. Ve çare, cîranen wî zûtire nehatin û evv xilas nedikirin.
Ji vedere, mirina mine min biqetîne. Lexin, min bikujin... De. De ha li min xin. Zevî ku ji deste min çû, mirin ji vve çetire.
Cendirman li rûye hevdû niherîn. Çavvîş:
Bi ceple wî bigrin, bi milan kaş bikin. Bavejin der. Kûçike heram. Mirine dbcvvaze. Na, vverin li mbcin, min bikujin. Küre kere, got.
Herdu cendirman mile wî girtin, bi erdere kişandin. We çaxe gun diyen din jî bi tirs hedî hedî hatin, nezîkbûn. Cendirme bi tiving bûn. Kesî mînanî par, meranî û cesaret nişan nedida ku herine ser kesî. Ye kî û duda:
Güneye, güne. Evv jî merive. Cima bi erdere dikişini? Hûn çi je dbcvvazin? Awqas meriv vve dora yekî girtiye.
Herdu cendirme sekinin. Li aliye ku deng je hat, zivirîn. Çavvîş:
Çiye? Çiye? Evv kiye, ere? Evv kiye tevî kare me dibe?Gişt di ci

ye xwede sekinîn. Li paş vvan, dengek vvekî denge tope kire gurrînî. Denge jineke:
Way daye. Wah be namusno. Hûn çi ji mere min dbcvvazin? Hû ne bi erdere kaşkin û bikujin? Ji bo xatire axe, hûn ji vî feqîrî, belengazî çi dbcvvazin?
Yen vvira vekişiyan û jinik hate cem mere xwe. Xeber dida, herdu desten xwe quloz dikir, ba dikir. Te nizanibû şer dike, an dua dike. Hi nek gundî dîsa hatin. Fate dîsa deste küre xweyî piçûk girtibû:
98
Hela bihelin. Hela bisekinin. Ev çi rezîliye? Hûn fedî nakin?
Xort û meren mezinin hûn. Ji bo xatire axe, li xelqe dbdn, mînanî kulavan bi erdere dikişinin.
Fate gelekî bi hers bû. Tirsa gundiyen xwe ku dît, her qehirî, vvek dînabû.
Hela çi bi vve hatiye? Li cem vve merivan bikujin, hûn nazivirin û napirsin ku "hûn cima wî dikujin?" Ev çito cîrantiye? Ev çito mera niye? Meraniya vve erde vve, ere vvelle.
Cendirman nedbcvvastin ku pesîra gundî berdin. Wîjîxîret dikir ku rabe ser xwe. Çavvîş ji gundiyanre:
Denge vve jine bibirin. Pir peşde diçe. Paşe baş nabe, got.
Hela le. Hela le. We nebaş bibe!
Leçega sere xwe rast kir û deste xwe bire singe xwe.
Bikuje. Bikuje... Ji mirine vvede çi heye? Çi disekinî? Ji bo xatire axe, bo evlegek erde axe bikuje, ku bira ji tere merxas bejin. Bira ji tere çepikan lexin. Bira nîşaneke li pesîra tedekin.
Denge xwe bibire. Denge xwe bibire jinik. Kare me îro eve. Hûn naçin, heqe xwe li cem hukumate, li jore nagerin, ten peşiya me digrin. Ma em bi sere xwe hatine vir? Em bi kefa xwe hatine vir?

Jora vve jî mînanîvveye. Hûn hemî... Jor jî, jer jî, hemû yekin. Gişt li aliye Ûsiv axane. Yekî ji minre beje, em jî xuliye li sere xwe bikin, herine cem vvî... Ere, gişt cima ne mînanî hevin?
Denge ve bibirînin. Awqas mer mînanî devvaran le diniherin, evv jî dire dira vveye.
Cendirman tivinge xwe hazir kirin, xwastin hemûyan dûr bbdn. Ji na merik vvekî dînan berve zeviya xwe reviya. Xwe avete erde. Giriya. Bi desten xwe, bi kulman xulî quloz dikir û li ser sere xwede direşand, li rûye xwe dida. Digiriya û diqiriya.
Cendirman bere deste xwe le nedan. Şofer sekinîbû, bîhna cbcareke dabû. Cendirme di nav xwede dipeyivîn, şerm dikirin li aliye jinan binherin. Hemû cendirma bi xwe jî gundî bûn. Ev çiqasî jî mînanî de û bave vvan bûn. Evv jî avvha digiriyan. Avvha dibeziyan û li hember derdiketin. Desten dayiken vvan jî avvha qelişî û tîş tişî bûn. Avvha hişk û ziha bûn. Rûyen vvan jî wisa qelyayî bûn. "Xwazüa evv nehatana vir. Xwazüa hevalen vvanen dine bihatana li devvsa vvan."
Ev tişt ne rinde. Le em çi bikin. Kare me eve. Heke ku nekî, ji jorve pirsen ne baş dibihîsî, deme ku dikî vve çaxe jî avvha dibe. Xwede eskeriye xirav bike. Biqediya, em jî biçûna malen xwe. Teskere na ye zû zû.
99
Ber xwe nekevin hevalno. Çi güne me heye? Em besûcin. Hemû der vvehane. Seren axa û gundiyan qet xelas dibin. Li Yozgata me jî vveha. Her sal çend kes tene kuştine.
Paşe hedî hedî nezîkî vve jinika ku digiriya, bûn. Mere vve jî hatibû. Fate bi küre xweve li vvir bûn. Soro li cem vvan bû. Bedeng û seren vvan di berde bûn. Hevdu rind fem dikirin. Mînanî ava zelal, mînanî şûşe, dile vvan hevdû didît. "Rabe em li reke dine bigerin. Tu tivingen vvan

nabînî? Ûsiv axaye benamûs ne di navdeye. Ev meriv şandine ser me. Me li hemberî hukumate nîşan dide." digotin di dilen xwede. Soro û Fate rind texmîn dikirin ev tişt. Li rûyen herdukan jî dihate femkirine. Rabe em herin xwûşka min. Rabe. Xwede mezine. Hela ka çi derî vedike.

Cendirman jî alîkariya vvan kir, jinik serwext kirin. Fate rûye cîrane xweyî bi toz, ji xulî û hesiran nedihate naskirine, bi bervanga xwe paqij kir. Jinik him diçû û him jî dizivirî li pist xwe dinherî. Li zeviya xwe meze dikir, nikaribû xwe bigre û dîsa dest bi giriya dikir. Di nav hilke hilka giriyande:

Xwede qebûl neke. Xwede qebûl neke. Giştî bi riya doxtorande bidin. Jin û namusa vve di deste xelqede bimîne. Hûn bibine al di nav xelqede. Xwede ve li erde nehele, digot.

Evv roj rind derbas nebûbû; Şofere ji Oeyseriye bekef û bedii bû. Mile wî be hemdî wî diçûn û dihatin. Ji ber bûyeren îro, cendirme jî kefxweş nîn bûn. Kar zû hiştin îro. Bîst bîstpenc serî tene ajotibûn ji zeviye. Dile kesî nedbcvvast. Bedii kar nedibû. Bi şev, gerek li traktör û benzine baş miqat bibiyana. Biparastana. Çi dibe, çi nabe?

Evare Soro, Mîro û se hevalen vvan rûniştin, peyîvîn. Bi zûtire qerar dan. Gelek kes gerek nizanibin. Çend kesen ku natirsin, li deven xwe xwayîne, şev vve ji peşve nezîkî ciye traktöre bibin û çend gullan di ser vvanre bavejin. Yen ku traktöre diparezin vve berve vvan ben, bi çend gulla dîsa vvan bbcapînin. We çaxe ji paşve yek ji vvan vve nezîkî bîdonen benzine bibe û eðir berde. Her tişt vve bişevvitiya. Traktör jî. Heke niha traktör neşevvite jî, meriv dikaribû paşe reke din bibîne. Ana ji vvanre wext lazim bû.

Her tişt rind fikirîbûn. Hemû kar Mîro hilda ser xwe. Ne karekî avvqas zehmet bû, levvra nedbcvvast Soro be. Çar heval, vve çenden din jî

hildana û ev kar bi cîh bihanîna. Di nav vvande, xwarziye Soro Elî jî hebû. We ji paşve nezîk bibiya.Bi şev ewqas gülle avetin, le bele kesek ji cem traktör û benzine neqetiya. Evvder terk nekirin. Wan jî bi çend 100
gullan bersiva yen dine dabûn. Ciye mazot, benzin û rûn çend qeratî dihate xuyane. Di nav bedengiya şevede denge ba dihat. Hale vvan bi Elîxweş nedihat. Piste pistek hatibû ber guhe vvî. Bele rind bihîstibû. Şaş nîn bû.
Qet ji vir neqetin. Dûr nekevin. Küre keran vve bîdonen benzi ne bişevvitînin.
Kar neçû serî. Beşik, fikra vvan dizanibûn. Anjî texmîn kirine.
Rojtira dine zevî dihate ajotin, gundiye xwaye zeviye û jina wî digi riyan, diqîriyan û li xwe dbdstin. Yen ku îşev bexew mabûn, traktör diparastin,
zanibûn bîdone bihatana şevvitandine, ve çare betir bi hers û bi qerar evv herdu ji vvir dûr xistin. Dîsa jî meriv nikare beje ku we roje baş kar kirin. Li ser bûyeren rojtira bere gelek tişt xeberdan evare.
Kar cima nebiribûne serî? Şeve devvar, çelek, ga dbdstine tevvlan. He la he pez li derve nedima. Bi dereng dbdstin goman. Çendekî şunde vve li derve bimana, le ne niha. Gelo him gom him jî tevvla axe bişevvitandana,
çavva dibû? "Evv bi nane me, bi jiyana me düeyize, xwarina me dibire, em cima yen wî neşevvitînin." Yek du peş derketin. Yekî qet xeber neda. Dîsa penc kes bûn. Ji berede tişten vveha hez nedikirin. Sere yen wisa kiribûn. Di davviyede bi neçariye qebûl kirin.
Nive şeve nezî gom û tevvlan bûn. Tirs û xof kete dilen vvan. Bedengîke vvisa hebû, merî je ditirsiya. Bi şik bûn. Ji nişkeve, vve agir berdana herdu ciyan jî. Agire her alîbigirta, paşe haya mala axe vve bibiya.

Ji male piçekî dûr bûn. Herder ku ji nişkeve bişevvitiya. Her tişt vve bi zûtire bibiya. Gelek bi xeter bû. Nobedar Şiko, Eso û Hesen jî bi çek bûn. Cendirmen ku vve du roja şûnde biçûyana, hela he li mala axe bûn. Ve sibe se cendirme çûbûn, le se hevv mabûn. Xeter pir bû. Ge rek meriv gelekî hişyar û serwaxtbe.
Bi şev li ber qunce gome, Elî qeratîk dît. Li vvedere telyayîbû. Elî ve çare jî hebû. Elî rind le niherî. Merik vvek tirsoneka di ciye xwede nedisekinî. Vî yalî û wî yalî dizivirî. Elî xwast ku di pist vvîre nezîkî go me bibe. Linge wî li kevrekî ket, deng da. Oeratiye peş gome, li havvîrdora xwe gülle reşand. Elî banzda pist sûre. Li dora gome çend kesen din jî hatin xuya kirin û bi çek agir kirin. Te digot ku dbcvvazin yeki bigrin, alîkariya hev bikin. Elî dûr ket, hate male. Ve çare jî haya axe bû ye, got di dile xwede. Bi curekî din nedibû. We çavva bizanibûna? Be re qet kesek li ber gome nedima. îşev te digot ku ordiyek esker nobedarî dike. Bele duh jî bihîstibû Ûsiv axa.
Ma "Dûr nekevin, vve benzin, mazote bişevvitînin", negotibûn?
101
Niha jî awqas tivdarek. Bele şik û şibhe tüne ku axa her tişten vvan dizane. Levvra tivdareken xwe jî dike, difikirî Elî. "Gelo kiye? Pfinc kes bûn. Ez jî li cem wan bûm. Yek ji vvanbe gelo? Dibe gelo? Yek xale Soro. Mîro û cîrane vvanî baş Evdo, Qasim û Seît." Nedbcvvast ku qet ji vvan yekî jî bikeve şikâ. "Ez ji xale Soro û Mîro şike nakim. Le evv hersekS dinfi. Evv cima bikin? Na lo." Yen ku di hişe vvîde derbas bûn, ji xale xwere got. Tiştek hebû di nav vî karide. Meriven axe traktör û mal her şev diparastin edî.
Li mala Mîro dîsa evv penc heval rûniştibûn. Soro bekef bû. We ça vva bikirana, çilobiserketana? Nikaribû qerar bide. Bivîhalîxweyî be lengaz, bi vî gundîtî û nezaniya xwe we bi çi teherî bikira ku kare vvan

baş biçûya? Xwede kir bi sebir bû, dilekî rast le bû. Gelek tişt zûtire dianî bîra xwe. Gundî hinek tiştan ji peşve texmîn dikin, ji vî aliyeve Sorodevvletîbû.
Ev du rpjin, me got, em tiştekî bikin, nebû. Me nebir serî. Ev ne güne meye. Ez texmîn dikim haya axe dibe. Hûn çi dibejin?
Li rûye hemûyan dinherî, hela ka bi çi teherî tene guhartin? Mîro mînanî wî difikirî. Wîjî li rûy hevalân xwe meze dikir. Me awqas gü lle avetin, gaveke jî peşta nehatin. Te digot ku bîhna benzine, bumajinfîn vvanin. Qet je neqetiyan. Her şev gom û tevvle mifte dikirin, berdidan. îşev bi dehan meriv li ber dipan, diparastin. Weha nedibû. Di vî karide tiştekî din heye. Ev axa ttştina dizane.
Ez jî wisa dibejim. Em çi dikin jî dizane, got Seît.
Evdo li ber xwe dinherî. Li vvan gundarî dikir. Le bele hiş û fikren vvî li ciyekî din bû. Guhen wî piçekî sor bûn. Sere wî dieşiya.
Tu çi dibejî Evdo?
Bi şik li dora xwe niherî. Xwast ku xwe qewî inşan bide.
Walle, axa gelek tiştan dizane û fem dike.
We hine tişt jî bigota, le nikaribû. Davvî vveha gireda:
Dibe yekî benamûs xebere dide axe. Ez jî dikevime şike.
Evdo hedî hedî hate ser xwe, rehet bû. Dîsa jî nikaribû li rûyen he valen xwe meze bike.
Hine peşneyar hatin gotine. Gişt jî ne di cîde bûn. Na, vvarin bira hemû kes sond bbcvvin. Na, kîji ke şik dike, bira beje. Heke ku eme ti şten vveha bikin, vverin em bi xwe bi desten xweve bikin. Kesî dine bi ra neye alîkariya me. Direj kirin û direj kirin. Soro di davviyede got: Hevalno, şik tiştekî rinde. Gerek meriv ji hemû kesî şike bike.
Hela he di sere şumlande şik merivan hişyar dike. Meriv riya xweye rast diðere. Kar hela he di serîde, geni nebûye, bîhn bi ser neketiye te

xüaskirine. Mînanî exmaqan, qet ji tiştekî şiknekirin ne kare merivane. Gerek hemû kes xwayîşikbe. Şike ku nekî, xetere, xirabiye, ne- başbûne zûtire nikarî bibînî. Nikarîfem bikî. Xirabiya herî mezin te peşi
ya merivan. Le bele vve jî bizanibin ku şik mala merivan xirab dike, hildivveşîne.
Hevaltiya merivan birîndar dike. Meriv bi xwe xirabiye bi
şexse xwe dike. Ji mala xwe dikevî şike, gunehe jin û keça xwe digrî. Ji hevale xwe şike dikî, paşe doste xweyî herî nezîk vvinda dikî. Tene di mini. Ji kevir, kuçikan, teyren difirî dikevî şike edî. Eva li hemû ciyan vvehaye. Binherin, em penc cîran li virin. Cîranen me yen dine hene. Em hemû ji bo hevdu, qenc û xirab sere xwe dieşînin. Ji bo ku erde xwe ji dest dernexin, digrîn û lava dikin. Heke ku em ji hev tekevine şike, paşe em nikarin du cîranan jî li ba hev bibinin. We çaxe em gişt zirare dibinin. Bisekinin, guhen xwe bidine ser kar û baran. Le ji kesî şibhe nekin. Ne vvisane ciranno? Hela bisekinin, ka çi dibe. Ji yekî ji mere bejin, ku tu ji bo hinek pere, ji bo hinek male dine, bi du pirsen axe yen şirîn diçîxiyanete dikî. Mbcbîriye dikî. We çavva bibe? Eme çi bikin? Ji xelqere, ji yekî dinre vvüo gotin zehmete, xetere. Him jî ne başe. Bi ya minbe, gerek em sebir bikin. Rind hîn bibin, ev çiye, cima avvha dibe.
Evdo:
Tu rast dibejî Soro. Le bele yekî vviloyîbeabûr, di gundde hebe,
gerek meriv bibîne û derxe eşkeretiye. Gerek merivbenamûsan ji gund derxe, got.
Hemû çûn. Paşe Soro gazî xwarziye xwe, Elî kir. Soro, Mîro û Elî
bûn. Roja betirper, vve şeve li cem bîdonen benzine, evv gotinen nobedaran,

Elî bi guhen xwe bihîstibû, an na? Şeveke bere, evv nobedaren dora gome û tevvle, çeken vvan, çend hevv bûn, gişt yek bi yek je pirsîn. Mîro:
Kî çi dibeje bira beje, ez ji Evdo dikevime şike, got.
Soro xeber nedida, bedeng bû. Heta niha, di jiyana xwede qet vve ha nebûbû. Ev kar ji wî zede bûn, pir giran bûn. Gundekî mezin, axa, hukumat, yen li dijî gundiyen xwe, alîkariya axe dikin. Ev gişt nediketine hişe vvî. Bere hinek tişten vveha bihîstibû. Bihîstin hesa bû, le be le wexta ku te peşiya merivan bi xwe, pir zehmet bû. Evvî jîji Evdo şib he dikir. Le çavva dikaribû avvha bike? Evdo bi salan bere, çi anîbû se re birayen xwe. Paşe çavvan jina xweye besuc, begune berdabû û pir sen xirab ji bo vve gotibû. Karen meran nîn bûn ev.
Le vvekî şiken vvan rast nînbûna? Ji bo merîkî, "yekîxwefýrotiye, ye kî xaîne" gotin, wisa ne hesa bû. Wekî ne rastbe? Yen vveha gotî, ma
103
paşe nabine derevvnek? Ev jî vvekî şütax avetina xelqeye. Çi ferq he ye? Fikirî û nikaribû ji nav derkeve.
Te çavva nişan bidî ku vvisane, Mîro? Tiştekî ku meriv baş niza nibe... Ya rastî, rind bifikire. Oerardayin zehmete.
Elî guhdarî dikir, tevî xeberdane nedibû. Bere fikirî, Mîro rast di beje, Evdo dibe ku tişten vveha bike. Te digot ku yek ji vvîre dibeje. Seît, Qasim tişten vvüo nakin gelo? Cima nekin? Na, evv jî dikarin bi kin. Levvra, hingî ku xale xwe guhdarî dikir, her diçû heq dida Soro. Xale wî nedbcvvast, zû zû kesekî gunehkar bike. Çi merivekî baş bû. Hertim, her roj van aliyen xale xwe didît û betir nas dikir, xale xwe ji bere zedetir hez dikir.
Ev çend rojin, kare traktöre baş nediçû. Şofer hînî van deran û van xurekan nîn bû. Piştî xwarinen bi rûn, şeveka sar, zikeşe pe girtibû.

Nexweş ketibû. Li dora navika wî te digot, bi tiştekî dikolin. Xwe bi zehmet diavete derva. Nava wî diçû. Navçûyineka bi xwîn. Roje panzde anjî bîst cara biçûya ser destave, dîsa tere nedikir. Nedbcvvast ji ser destave rabe. Rûviyen wî lebûn, perçe perçe bene xware. Tişten mî nanî palaxe hebûn di destava vvîde. Di rojekede zirav bû. Çilmisî û zer bû. Wexta radibû li ser xwe, peş çaven wî reş dibûn, hişe wî diçû. Bi tasan av vedbcvvar. Dile wî dişevvitî, dîsa jî ter nedibû. Oehvva tehl, ça ya hişk û çi nedane? Qet fede nedikirin. Mast û avdevv vedbcvvar bi ser hev. Se roj avvha derbas bûn. Paşe birin ser doxtir. Bi vî teherî heftekî nexebitî. Piştî nexwaşiye jî, mîna bere nikaribû kar bike edî.
Li nevvala berve Kanîsipiye, feza gund, qedereke ji gund dûr, çem nav kevir û zinaranre derbas dibe û dikişe. Di nav vvande, hine ciyen ave, golen piçûk çekirine. Meriv li vanderan dikare tekeve ave. Mer berve jor diçûn û diketine ave û destav digirtin. Jin, se çar hevv bi hev re diçûn, yeke nobedarî dikir, yen dine av li xwe dikirin û xwe dişûştin carna.
Riya Kaniyasipiye, di feza nevvalere derbas dibe. Levvra kes nikare lijere, kesen dikevine ave bibîne. Cîkî avvha, bedeng û bekes tüne. Car cara nave ve nevvale tevî kurt û pisten gund dibin.
Elî li peş zinare sipîre vedigeriya. Ferq kir, ji jerve Hesene Hcmzo te. Hesen hat li ser kevirekî mezin rûnişt. Destava xweya mezin kir. Paşe xwe tezî kir, kete ave. Av di nav kevir û kuçikanre bi deng diçû. Levvra meriv denge kesî zû bi zû nedibihîst, hetanî vvan nebîne. Den ge linge kesî nedihate bihîstine. Ne hesan bû.
Elî qirma xwe her tim bi xwere dibir. Le niherî. Deve vvede gullek hebû. Bedeng berve jer bû. Hat ciye kincen Hesen. Evv di nav avede
104
bû. Careke duda xwe cûmî bin ave kir.. Bi desten xwe çaven xwe miz

dida. Dev û leven xwe bi ave şuşt. Careke din jî xwe di avede kir. Sîng û şeqen xwe miz dan. Bi hînbûyina bere, mînanî hinek li der dore he ne, bi desten xwe ciyen xweyen serme vedişart.
Elîxwe dabû ser kevirekî, bedeng li Hesen meze dikir. Mînanî pûtekî ji kevir. Mînanî kevirekî reş. Deste xwe bir ser debanca xwe. He sen xwe şûştibû. Berve kincen xwe zivirî û Elî dît. Bi herdu desten xwe, ciyen serme rind veşart. Xwe hinekî nizm kir. Tirşe pe girt. Çaven vvî betir mezin bûbûn. Tiştek negot. Elî derpiye vvîyî nîvqirej avete vvî. Derpiye xwe lbcvveke Hesen. Li xweke ku em hinekî xeber bidin. Hesen ji denge Elî hinek tirs, lerzok û şik ferq kir. Bi vî halî Elî qet baş nedbcuya. Gelo cima li vir bû? Ji bo tiştekî xere nîn bû.
Derpiye xwe li xwe kir, sere xwe bilind kir û gavek peşde avetibû ku Elî debance di destde, ji ser kevir bazda, hate jere peş vvî.
Neye. Bisekine di ciye xwede.Hesen şaş bû. Bû bilde buda vvî. Diricifiya. Tiştekî bexer texmîn dikir, le bele debance nehatibû bîra vvî. Li vedere, merivek gulleke li mejiye vvî, li dil anjî zike wî xe, biku je, bi rojan haya kesî nabe. Cima hatibû vedere, tekeve ave.
Tu dîn bûyî Elî? Tu ji min çi dbcvvazî? Elî, Elî ez qurbana teme.
Jin, zaren min hene, vvan bîne ber çaven xwe. Te vvan etim bihelî. Çi vve bi deste te keve?
Bavveriya xwe ji jiyane birîbû. Bi xwe jî bi gotinen xwe îna nedikir. Tu bersiven min bi rastî bidî, ez tiştekî bi te nakim. Na, nebû, ne Ûsiv axa, qet kesek jî nikare te ji desten min xüas bike. Gullek li me jiye te, besî teye.
Elî, neke, Elî. Debance bikşîne wî yalî, em xeber bidin. We teke şûne.
Dest bi lava kirine neke Hesen. Van berde.
Hinekî din jî nezîk bû. Debance anî rex sere vvî.

Beje. Yen di gundde dibin, kîji Usiv axare dibeje? Nebe, nebe, bbcvvazî min mîna zarokan bbcapînî! Bi edeb û namus beje. Ez jî sond dbcvvim, tu tiştekî bi te nakim. Kesîre nabejim ku te gotiye. We di na va me herduyande bimîne.
Ez qurban, tu nexerîbî. Tu çavva qemîşî min dibî? Tu zanî, vva lle, ez bi peran jere dbcebitim. Li ber traktöre nobedariye dikim. Tu dbcvvazî, ez dikarim vvîjîbihelim. Çi bikim, bû careke. Walle, bille poşmanim
ez. Min careke gû xwar. Bû, çû.
Wan dayne li alîkî. Di deste tedeye. Çi dbcvvazî dikarî bikî. Kes peşiya te nagire. Çi heqe min heye? Ez kîme? Li ber çime? Beje, van
105
rojan, kî diçe gotinen gundiyan ji axere dibeje? De zû beje! Ez naxwazim awqasîjî direj bikim. Heviya yekî bisekinim ku be vira.
Nizanim. Walle nizanim. Ezji axere tu tiştî nabejim. Xelq nahele ez nezî vvan jî bim.
Niha, tu nabejî ne? Suc, güne ji hustiye min çû. Heta bîsta ji te re molet.
Fem kir ku hal xetere. Dest û milen wî bi rexde diricifiyan. Muyen çermî wî top topî bûbûn, mînanî seren derziyan. Av ji pore wî dirijiyan, dilop dikirin. Çeqe çeqa dev û diranen wî bûn.
Yek... du... se... çar...
Elî, vvalle nizanim. Deste xwe bi xwîne meke. Xwîna min neke hustiye xwe.
Heyşt... neh... deh...
Heyjde... nozde... Te bejî an na? Wext qediya edî.Bere debance berve eniya wî kir. Çaven Hesen te digot, lene ji cî derkevin. Diricifî û li Elî diniherî. Ji nişkeve li erde ket.

Eze bejim. Eze bejim.
Elîji jorve deve debance da ser sere vvî.
Zû beje.
Hesen bi zor ji deve xwe derxist û got.
Evdo.
Dest û piyen wî bi zingînî düerziyan, dile wî lebû ji cî derkeve.
Min bi namus sond xwariye, ji kesîre nabejim ku min ji te bihîstiye.
We di nava me herdûyande bimîne. Ji min netirse. De xwe tazî bike, tekeve ave dîsa. Hetanî ez dûr ketim.
Kincen wî di hemezede, dûr ket. Paşe evv dane ser kevirekî. Hesen hela di nav avede bû.
Du roj derbas bûn. Evv penc kes dîsa li ba hevdu bûn. Cara dine gom û tevvle şevvitandin neanîbûn cî, ve çare gerek ev kara biçûya se rî. We çavva bikirina, dûr, direj xeberdan. Paşe çûne malen xwe.
Mîro û Soro, Elîşandine malen hevalan, xenji Evdo gazî vvan kirin.
Ve çare nizm xeber didan. Gelekî li ser gotinen xwe disekinîn. Yen nûhatî, tiştek fem nedikirin. Ev çibû? Cima avvha bû? Dîtin ku vve beî Evdo van karan xeber bidin. Gelek tişt texmîn kirin. Çaven vvan dikeniyan. Kes ji vvan neketibû şike.
Soro ji hevalen xwere got, baş hîn bûye ku Evdo ji axere hemû ti ştan dibeje. Betir nedbcvvast xeberde. Ji cîkî pir bîr û bavver hîn bûbû, ku Evdo wisa dikir.
106
Gom û tevvle na, em dbcvvazin traktöre dûr bbrin. Bi çi mereye şevvitandina heyvvanan. Me vve roje vveha xwest, le evv jî ji qehran û hersan bû. Em çi ji pez û devvaren beziman dbcvvazin? Na bavo, na. Çi güne vvan heye?
Dipeyivî, hevî û bavveriya wî bi xwe jî bi xeberdana wî dihat.

Ji hers û qehran tişten baş dernakevin. Paşe poşmanî te. Gere em traktöre ji vir dûr bbdn. Hela he gelek kar jî nekiriye. Evve li cem gom û tevvlan li benda mebin, eme benzin û tişten vvan bişevvitînin. Kî, vve çavva bikin? Bi çend merivanve, gişt hatine xeberdane. Ve çare bi zehmet nedihate xuyane. Niha traktör li dûrî benzine didane sekinandine. Ne wisa buya, vve bi hevre bişevvitîna. Çi baş dibû vve çaxe. Piştî nîve şeve meriven axe bi telyayî disekinîn, mînanî neçîrvanan.
Axa bi hers:
Gulla mavejin hevvaye. Van diz û tolazan bi xwe bikujin, birîn dar bikin. Çend hevv ji van kuçikbavan li ser qûna xwe nekevin, nemirin, dest ji van karan nakişînin.
Ji nişkeve benzin, mazot, rûn û tişten vvan agir girt. Te digot, deng bi ezmana diket. Bîdon du caran bi dengen bilind teqiyan. Şewqe di da der doran. Mîna tîrej û şewqa roje. Her diçû alaf bilind û zede di bû. Agir carna kem û nizm, paşe dîsa bilind û pir dibû.
Şofer û ye ku alîkariya wî dikir, li benda traktöre bûn. Tiştek bi vvan nebû. Di bin traktorede radizan. Nedbcvvastin je dûr bikevin. Di hundirde nediman. Agir, alaf dest pe kir, şofer gelekî bi aqü û be zehmet traktör hejî dûr xist. Dibû ku ji agiren der doran difýriyan, bi qirş û gîhayen dişevvitîn, lastiken traktöre jî agir bigrin û bişevvitin.
Kes bi dest neket. Ev çendek bû ku gundî gelek bekef bûn. Ser ve şevvate hinekî şa bûn. Li eðir meze dikirin, dizanibûn ku vvan bi xwe şevvitandiye, agir berdaye. Te digot, alafji dilen vvan quloz dibû. Dîsa jî neheqî ji kesîre nedima. Li erde nedima. Bi dilşayî û kef eðir diniherîn. Ji hev dipirsiyan.
Ke şevvitand? Ere ke şevvitand?
Kî çi zane? Oûlekî xwedeyî baş şevvitandiye.
Qet kesekî axe tunebû li vvira? Te bihîst, vve roje jî hinekan xwastiye

bişevvitînin. Paşe tirsiyane û reviyane. Evana bi dil û cesur bûne.
Te dît, küren xelqe çito bi dilin? Çi merin? Careke hînî van ka
ran bûn, edî axa bi vvan nikare. Her roj tiştekî vvî, vve bişevvite.
Ez jî wisa dizanim. Oro, qet natirsin lo.
Cima bitirsin? Kî zane kîne?
107
lîşandibû gund. Nizam çi, nizam çi. Qaymeqam jîjere gotibû, gerek
vî karî gelekî peşde nebe. Paşe sere wî vve bieşe. Yen jore, vve li ser vî
karî bisekinin û bipirsin.
"Him her tişt bira başbe, him jî bira poze kesî xwîn nebe. Paşe jî di
bejin, tiştek bibe em nikarin te xilas bikin. Li bajer digotin, qumandar
rişvete distîne. De bira bejin. Kîjan memur heye, rişvete naxwe? De
ve te ku heye, te bbcvvî. Ye ku naxwe, nahelin bijî." Di vî vvarîde tirsa
vvî tunebû. "Çi dibe bira bibe. Le wexta tiştekî dikî, gerek be deng bi
be. Bîhna vve dernekeve. Li ser berfe here, le sopa piyan nehele." Levv
ra xwest, ve çare gotinen vvan bigre. "Hinekî bitirsîne. Paşe hinekan ji
vvan berde û yen din bişîne cem savvcî. Bira hiriekîjî sere wî bieşe. Hertim
cima eze pere mijul bibim. Di nav xelqede xirab bibim. Yen dine
û savvcî vve bizanibin ku ez ne neheqim."
Gişt yek bi yek guhdarî kir. Qet haya kesî tunebû, wisa digotin. Hi
nek kal û pîr piçekî dane xeberdane. Oerare xwe dabû, vve ke bigre û
ke berde. Ji nav bîst kesande neh meriv berda bû. Di nav vvande Ev
do û Elî jî hebûn. Elî gelekî cahil û zar dihate ber çaven vvî. Xale vvî
ku li vvirabe, çi güne vî tifalî hebû. Gotinen van yanzde kesan, da
nivisandine.
Du rojan li qereqole man. Ji vvan neh kesen dinere xeber da
û evv şîret kirin. Paşe evv şandin malen vvan. Ev yanzdeyen ku li qereqole
mabûn, gotinen hemûyan mîna hev bûn. Haya vvan ji tu tiştekî tunebûn.

Ûsiv axa giliye gundiyan kiribû. Oumandar bere gotinen vvî guhdarî kiribû. Kaxiza şîkate xwe, dabû qumandar. Oumandar ev he mû dane nivîsandine û şande ba savvcî.
Di derheqe vî gundîde, savvcî, bere ji qaymeqam, hinek memûren dine gelek tişt bihîstibû. Traktör şevvitandin... Benzin, gom û heyvvan şevvitandin... Meriv nikaribû van tiştan piçûk bibîne û guh nede. He ke tapiyen gundiyan hebûna, güne wî ye bi vvan bihata. Le bele evv him neheqin, him jî zore dikin.
Dihate xuyane di derheqe van gundiyande, savvcî ji bereve tişten vvisa bihîstibû, li ber çaven wî evv neheq bûn. Kirinen Ûsiv axa jîbeled bû. Zanibû evvî çi kiriye, çi nekiriye. Çavva bûye xaye vî gundî. Gişt rind bihîstibû. Le bele çi ji vvîre? Qanûne heq dida Ûsiv axa. Evv jî memûre qanûne bû. Kare wî ev bû.
Yek bi yek evv kaxiz xwandin. Careke jî bi xwe pirsî û guhdarî kir.
Bi vî halî gerek kes negirta. Evv jî nedibû. Di destde tiştek tunebû ku vvan bigre. "Le vvakî herin hinek tişten nû bikin. Paşe vve çi bibe?" Ya rastî, van çendekî di girtîgehede bigre. Paşe hers û tûjbûn ku derbas
109
bibe, vve vvan jî berda. We evare se kes berda û heyşt gundî girt savv cî.
-XXIGirtîgeh
kîlometrek li dûrî bajere. Li der dora vve awqas xanî tu
nin. Oedereke vvede çend malen nizm hene. Li feza reya ku diçe vvî layete û nava bajerve derbas dibe, diket. Re bi vî halî herdu taxen ba jerji hevdû diqetand. Xanîkîkevn, bi keviran çekirîûzexmbû. Se öden mezinre "qowîşen mezin" digot girtiyan, di nav xwede. Du hevv jî öden piçûk hebûn. Girtiyen bi qedir û qîmet, gelek caran di van öden piçûkde diman. Di qowîşen mezinde, ciyen razane bi daran çekirîbûn û

sezde, çarde kes diman, le bele niha ji sîhî zedetir tede radizan. Nave bajer ne baş derketibû ku gelek şer, dizî, birîndarî le dibe. Jimaren gir tiyan her tim zede bû. Her diçû zede dibûn.
Di vvan herdu qowîşen piçûkde gundiyen devvlemend û bajariyen bi nav diman. Axa û bajariyen pir tene naskirine, tu cara nakevine girtîgehan.
Ye ku em dibejin, yen hal û waxten vvan baş bûn. Ji yen avvhare, ve dere, "bi qedir, xwayî der dor" te gotin. Di van odande çar meriv diman. Eðer ku tekevine tengasiye anjî nasen ji yen bere ben, yek du hildidane cem xwe. Yen mezin ne wisa bûn. Ji aliye feqîren nû hatîve, car cara baş dibû ev halen qowişen mezin. Yen nû hatî, nivînen vvan tunebûn, di nav du ciyan xwe direj dikirin, radizan.
Heyşt gundî, di nava cendirmande hatin ber girtîgehe. Dîvvare der bilind bû. Li ser dîvver telen bi strî kişandibûn ku kes nereve, nece der. Dere der bi hesin bû. Nobedarekî bilind, qelew, simbelboxe û esmer deri vekir. Li ser, kincen rome hebûn, mînanî yen nobedaren gund bûn.
Bere evv hildane baxçe hundir. Yen nû hatî şaş û metel bûn. Keder jere nîşan didan, diçûn vvir. Baxçe vala bû. Hemû li vvir bûn niha. Direjiya baxçe panzde metro hebû. Kember bû. Deh metro berayî. Dîvvaren we qalind û fýreh bûn. Bejna se meriyan zedetir bû bilindayî.
Şeş metro dihate xuyane, bi texmînî. Li ser dîvver, telen bi strî li havvîrdor kişandibûn. Bilindiya telan jî nezîkî du metro bûn. Di quncekîde nobedar, tiving di destde. Evv ciye ku nobedar li dore diçû dihat, bi berayî û direjayî du metro hebû. Him li der û him jî li hundir dinherî.
Li ser xenî bi xwe jî, dîsa nobedaren bi tiving hebûn. Soro ve çare, ji hale xwe aciz nîn bû. Tirsa wî kutan û lexistin bû. Lexistinen cara

din, di rede hatibû bîra vvî. "Gelo ve çare dikarim damîş bidim? An bikevim,
xuva herim û cendirme bi min bikenin." Qet tiştek nebûbû, levv
ra bi kef bû. Hepisxane bere jî dîtibû. Hepisxana Edene hate bîre. Ev
der tu girtîgehe li cem ya Edene. Bi hezaran kes. Ji her müetî. Çi di
ðeri, tede dikarî bibînî. Naskirina vvir, hînbûna vvir çend meh dbcvvaze.
Wisa te xuyane ku evder cîkî xirab nîne.
Li penceren ku ü baxçe dinherin, hemû çav li ser yen nûhatî bûn.
Simbelen qalind û badayî. Çaven mînanî agir diçirisîn. Mîro li cem So
ro bû. Niçande vvî, "hevalen meyen vir ha."
Cendirmen ku evv hambûn, bi kaxizanve çûne hundir. Sergardiyan,
bi poren vveşyayî û bi çaven ken, li vvan zivirî:
Derbasîbe. Hûn bi xer hatin. Cane vve saxbe.
Li ser deriye girtîgeheyî hundir, du mifte hebûn. Mevanen nû ke
tin hundir û çûne odeke piçûk, li aliye raste. Sergardiyan nave vvan li
deftereke mezin nivisî.
Ye mayî, nivîsdar bira sibe biqedîne. Min dbcvvast ku vve hemû
yan di cîkîde bihevvînim. Hûn ne hindikin. Eðer mayina vve ya vir di
rej bû, eme jere reyeke bigerin. Niha eme çar hevalan ji vve hildin ve
qow£sa mezin. Çare dine jî qowîşa hana mezin. Ya dine heta dev û le
va tijiye. Dinherim ku qet tiştekî vve jî tüne. We dest û piyen xwe hejandiye
û hûn hatine.
Soro dît, sergardiyan yekî nerme, bi merivanre mînanî bave meri
van xeber dide. Xwest jere sebebe vî halî beje.
Me bibaxşîne, me nizanibû vve avvhabe. Ji nişkeve wüo bû, em
destvala hatin.
Bele. Bele. Hertim wisa dibe. Paşe tişten xwe tînin gişt.

Hevvş û pist deriye ku evv lene, tijî girtiyen kevn bûn, yen nû meraq dikirin. Paşe bûne du qîta û herine qowîşen xwe. îşev girtiyen kevn, vve nivînen xwe parvekirina, hetanî sibe, ji gund nivînen vvan bihatana. Dema vve biçûna ciyen xwe, nobedare derve diqîriya. Tendurekiyan fem kir, gundiyen vvan li ber derîne. Ji xwere nivîn teme kirin. Evv gar diyana mezin û qelew damîş nebû.
Lolyo. Hûne çi bbcvvin? Rûn, pener, bibcur, hema çi dibinin, ji bo xwarine bîr mekin, bi xvvere bînin sibe.
Derbasîbe bira.
Xwede ji te razîbe.
Merheba^ Derbasîbe. Derbasîbe.
Tu saxbî.
Derbasîbe.
111
Soro, Mîro, Oasim û gundiyekîwanîxort bi hevre bûn. Seît û se he valen dine jî, di qowîşekede bûn.
Girtiyen kevn, Soro û hevalen wî gazî çaya evare kirin. Li ser ciyan rûniştibûn. Çar mevan û yen dine, hinek gencin, hinek jî kalin. Simbelen vvan bi kefa te bûn. Ji kine û sole vvan wisa dbcuya ku gundîne, an jî nû hatine bajer. Kesekî devvlemend di nav vvande tunebû. yekî xort qedehen be tarîlk tijî çay dikir. Çayeke giran bû. Bere dane mezin û mevanan. Li ser xwestina vvan çay du carî kirin. Yek li aliye Soroyî ras te rûniştibû. Bi texmînî, pencî salî hebû. Leven wî qalind, zik berdayî, li ser pişta deste wî deq deqî û îsterk çekirî. Piştî çaye ebcare keremi mevanan kir. Soro paşe hîn bû, nave wî Evdilqadire.
Binherin, biraziyen min. Dibe hûn nizanibin. Bere peşîn, du se edeten vira ji vvere bejim. Paşe em tişten dine qise bikin.
Zivirî û serîde li rûyen vvan niherî.

Qe hûn bere raza bûn?
Na xer. Qet ne yek ji me jî, got Soro.
Çîroka xweya Edene qet qal nekir. Çi hevvce bû? Eðer ku ciye vve be, meriv dikare qal bike, got xwe bi xwe.
Li vedere, her sibe nanekî didine meriva. Mînanî nanen eskeriye. Wisa ne xweşe, le bele dîsa jî nane.
Keniyan. Yekî ji vvan:
Tişten avvha sere vvan bbevve.
Yek jî nîvro xwarin didin. Nok, bibcur anjîgirar dibe. Hemû avvqase. Bira çaven vve netirse birazîno. Em hinek rûn û îsot tevî dikin. Wisa nebe naye xwarine. Xenji qowîşan, mitbaxeke me heye. Gişt li vvir xwarina xwe çedikin. Tere nake. Levvra, hûn diniherin, li qowîşan bi bihna ocaxen nifte meriv nikare bisekine. Hinek, xwarine ji hev didizin. Levvra em tiştan jî li vir dihebînin.
Piren vvan keniyan.
Du ciyen destave hene. Yek di hundirde, yek jî li derveye. Ava herdukan jî zedeye. Di vî alîde ev der başe. Yen dine, hûne hedî hedî hîn bibin. Me bihîst ku hûn ji Tendûrekene: Ev sere çiye?Soro zani bû, girtîgeh cînen be îtbarin. Hela he hevalen xwe, ji vî alîde hişyar nekiribû.
Erde günde me, ye meye. Le bele deste meda tapî û tespît tu nin. Di deste Ûsiv axade jî tunin. Evvî kare xwe kire re. Erde meji des te me girt. Traktör hanî û berî me da. Me xwast ku bi nîvîkarî û mîna bere kar bikin. Nebû. Me lava kir, em ber Ûsiv axa geriyan, dîsa ne bû.
112
Yen dine bi meraq guhdarî dikirin. Te digot Soro, çîrokeke ji devvra bere dibeje, wisa li deve wî dinherîn. Her roj ev tişt li cem vvan jî di

bûn.
Yen ku zeviyen vvan bi traktöre hatine ajotine, giriyan, kirin zare zar, dîsa nebû. Paşe ke şevvitand, çavva bû kes nizane. Yekî Maraşî, şirîke Ûsiv axa, xwayî traktör. Traktora wî şevvitandin şeveke. Evvî jî hişt çû. Tu çavva zanî ke şevvitand, em jî vvisa. Paşe hinek erde xam da me. Me kirin zevî. îsal dîsa traktör hani. Me dîsa lava kir, nebû. Xwede jî zane ku haya gundiyan tüne bû. Ve çare jî benzîna wî şevvi tandin.
Evdüqadir sere xwe ba kir. Hinekan:
Way çave min bin. Çi xweş kirine, got.
Yekî din qehirî:
Denge xwe bibirin lo. Çi dikevî nava pirsan? Bise bira merik be je-
Paşe jîji bîst kesan ketine şike. Neh kes, du rojan di qereqolede girtin û di davviyede evv jîberdan. Em birin cem savvcî. Wîjî se kes berda. Bi ya vvan, hinekan ji me şevvitandiye. Em heyşt jî hanîne vir, birano. Ne kesî dîtiye, ne jî şahit hene. Wekî ez niha bibejim ku ez ji te şike dikim, qet avvha dibe?
Paşe xwastin ku şîve bi hevre bbcvvin. Soro, Mîro tev hineken ji be rede girtîbûn dbcvvarin. Herdu hevalen vvan jî li alîkî din, li ser ciyen vvan, xwarina çend girtiyan parvedikirin. Her der di nav qirejede bûn. Feraq jî vvisa. Xwerege vvan savar bû. Dabûne nava xwe, çend serî pîvaz jî hebûn. Di nav deh deqîqande, di vve beroşa mezinde qet tiştek nema.
Bi şev, her yek ji vvan, di cîkîde, nav hevalen nû razan.
Ji deh rojan zedetir bû, ku li vedere bûn. Hînî vir oûn. Ji gund nivî nen vvan hatibûn, tivdareke xwarine jî kiribûn. Hemûyan tev dbcvvar. Sibe û evaran du seet li baxçe, bi sere xwe bûn. Dor bi dor digeriyan.

Nave gera vvan, di girtîgehede "volta" bû. Yen ku cezayen vvan zedeye, li ve hepisxane nadin sekinandine. Levvra, ji hepse revîn kem bû, li vir.
Qedre Soro digirtin. "Yekî bi aqüe" digotin ji bo vvî. Şeveke, evv hevale ku li tenişta wî radiza, bi dizîkave, di bin oncanede ji Sorore got:
Evv Evdüqadir, evvî qert, bi esrarkeşeke. Doste axane. Tu nabînî, qet rojeke ji bo vvan pirseke xirab ji dev derdikeve? Di kadîna xwede esrar veşartiye. Hinekan bcbar kiriye. Hatine, evv girtine. Van şibhe kiriye ku cîranekîvvan îxbariya vvan kiriye. Evdilqadir û küre wî me-
113
rike cîran kuştine û bere xwe dane çiyan. Nişan nade le, mînanî marane. We şeve xew nedikete çaven cîrane Soro. Evvîji Soro gelekî hez ki ribû. Soro jî ji vvî. Kem xeber dida. Doste hemûyan bû, tevî her tiştî nedibû. Hinekan xwûşka wî revandibûn, vvîjî li vvan xistibû. Kes nemiribû, le du meriv birîndar bûn.
Soro:
Te cima wisa kir? got û je pirsî.
Xwûşka min bedevve. Sezde salî bû. Destgirtiya kurape min, Ke mal bû. Xwûşka Kemal jî li cem mine. Ape min zûve miriye. Malen me di hundire hevdane. Mînanî maleke. Ji me vvede gundek heye. Ye kî devvlemend heye li wî gundî. Devvlementiya wî sere wî bbcvve. Ha tin û qîzik ji me xwastin. Du jinen merik jî hene. Mere male, mezine male, min dihesibînin. Bave min, berî se salan emre xwe qedand, bû qurbana te. Me got ku evv destgirtiya Kemale. Me hela he nişanî ne kiriye, le pirs û qerar daye. Evv dibejin ku pirs û qerar çiye? Nişan tü ne, nîkah tüne. Kemal ku ji eskeriye hat, vve yeke dine bibîne, gotin. Rojeke min dît ku xwûşka min, li cem diya min digirî, "daye ev merika qet ji xwede natirse. Ez devvsa keç û neviya vvîme. Min dixwaze. Ez

çime? Zarokekim. Ez çavva ji vvîre dikarim jintiye bikim? Daye ezqurbana teme, min nedine vvî." Bave min ji xwûşka min pir hez dikir. Min ku dît evva digirî, bave min hate ber çaven min.
Xwûşka min, cima em mirine, tu digirî? Xelqe ji mere çi beje?
Çi ferqa destgirtî û jina markirî heye? Eze te bidim küre ape me. Ne yekî din.
Evv li vvir nesekinî, reviya çû derve. Çaven min kelo girîbûn. Me ca reke din jî merik vegerand û qebûl nekir. Paşe rojeke, du mevan ha tin. Gotin ku em dereng mane, bi edeb û töre bûne mevan. Me got ku mevan, mevane xwedene. Ser sere me hatine. Şev, diya min, jina min û ez giredan. Xwûşka min revandin, birin. Ax cevvre xinzîran. Paşe ça vva bû, ez filîtîm. Min tiving ji bin ister derxist û pey ketim. Min niza nibû ku bi kîjan alîde çûne. Min aqil nekir ku ji gund hinekan pe bihesînim. Mala me qedereke ji gund dûre. Min bere xwe da günde vvî merikî ku xwûşka min dbcvvast. Min xwe neda re, bi cîkî kin û kurtre, çiyere çûm. Hîv hebû. Li ser riya gund min evv ferq kirin. Riya çiye ez vvestandibûm. Mînanî dîna bûm. Kuçiken küre kûçikan. Mevan vvere, bbcvve, raze. Paşe rabe, be namûsiye bike. Ji ber girekî zivirîm, hatim peşiya vvan. Xwûşka min di erdere kaş dikirin. Qîzika feqîr, te bidîta
114
mînanî kaxizeke, di dest vvande diricifiya. Ji bo ku li vve nexim, min gü lle neavete wan.
Bisekinin, lolyo. Be namûsno.
Sekinîn. Bi sekinandinere dest bi reşandina gullan kirin. Xwûşka mine belengaz mînanî dînan, bi şûnve direviya. Wan jî gülle diavetin min. Ez li cîkî baş û feza vvan bûm. Evv li peş min eşkere û veneşartîbûn. Min evv rind didîtin û li ser hev du cara agir kir. Yekî "wax daye ez mirim" got, qîriya. Her tişt li ber çaven min reş û tarî bûbûn. Min

dbcvvast, vvan bikujim. Y£ ku ne birîndar bû, xwast nezî hevale xwe bi be. Min yek jî berda vvî. Evv jî birîndar bûbû.
Min gazî xwûşka xwe kir, da sekinandine. Soro, te bidîta. Meriv awqasî ditirse. Awqasî perişan dibe. Lingen vve di nav xwînede bûn. Por li hev vvalyayî, serqot bû. Leçega xwe vvinda kiribû. Xwe avete hemeza min û giriya. Li nezîkî vvir gundek heye. Dengen gullan bihîstine.
Berve vvan çûm. Ciye birîndaran min ji vvanre got, em hatine günde xwe. Roja dine çûm, min xwe da dest. Evv jî rakiribûne nexweşxane. Yek ji sînge xwe birîndar bû. Çend rojan bere ji nexwaşxane derketiye û doxtoran rapor dane. Ye dine, çîpa wî û linge vvîşikestiye. Di alçiyedeye niha. Çar men bû ku ez li virame.
De û xwûşka min, her hefte tene dîtina min. Ji te çetir nîn bin, cîranen meyen baş hene. Hemû di kare vvande ahkariye dikin. Kemasiya min nî^anî vvan nadin. Küre ape min vve meheke şûnde teskere bistîne, eskeriye biqedîne. We çax£ tu saxbî, eze be minet cezayen xwe hikişînim
Giştan mencasiya Bekir qebûl dikirin. Ji bo namusa xwûşka xwe, du kes birîndar kiribû! Hineken din ji Sorore qal kiribûn. Şeveke dîsa di nav pirsen xwede got:
Biraye Soro, hevalen vve yen di qowîşa dinedene, xwayî zimanen xwenînin.
Bele, hinekî zede xeber didin, beteşene. Ez çi bikim Bekir?
Binher, ez ji tere bejim. Bavverî gelekî nayen kirine di girtîgehande. Ku di hundirde dûr û direj dimînin, aliye meriyayî xirabiye gi ran dikişine. Meriv dibe yekî pîs û qellaş. Di hepsande yen ku avvha dibin pirin. Hela di hefta nû hatîxirabiyen vvan xwe inşan dide. Ýftira, güîkirin, xeywkirin, çi bejî dikin. Çi te bîra te, giştî jî. Her roj xeberen nû dibin û digîhînine sergardiyane girtigehe. Xwede kiriye, evv sergar

diyan merivekî başe. Guh nade. Bi iftiran îna nake. Yekîdinediye. Me riven avvha baş nasdike.
Soro fem kir ku Bekir xetereke dbcvvaze jere beje.
115
Tiştekî ku tu zam heye? Çiye? Cima, çibü?
Bele bira. Di qowîşa dinede, hevalekîvveyî qemer û reş heye. Pir xeber dide.
Ere, ere. Bele. Çi kiriye?
Virde wede xeber dide. Na motor jî, benzin jî min şevvitand. Min çû bi sere xwe agir berdaye. Li pey min gülle havetin, le qet nezîkî min jî nebûn güllen vvan.
Soro şaş, metel ma. Yen dine jî, li cem vî derevvnekî bedeng disekinin û guhdarî dikin? Çavva dibe? Le Seît? Çavva be aqüî kiribû, jere tiştek negotibû? Le. Wisa, ere...-Way derevvkare rezîl. Binher, te bi bînî, ev pirsa vve bizivire paşe here ber guhe savvcî. Te vve çaxe bibînî. We bi xwe tekeVe belaye, bi saya zimane xwe. Meriv dişevvitîne. Dişevvitine,
le li zimane xwe jî dibe xwayî.
Paşe Soro ji Seît pirsîbû. Hîn bû. Wexten ku Seît ne li vvirbe, qal di kir. Du roja bere Seît je şibhe kiriye. Evvî Seît nîşanî kesen ku pere xeber dida kiriye, "even tirsonek dexesiyan min dikin" gotiye. Li cem Seît qisen avvha nekiribû.
Mîro vve pere xeber bida: Bi zimanekî ku evv je fem dike, evv hişyar bikira, pe bihesanda. Yen kü bûyî bûbûn edî. Xwede kir ku evv tişten qal kiribûn qet yek jîwî nekiribû û tede jî tunebû. Serda qet haya vvî jî nîn bû. Li gund, ji Ûsiv axare dabû çera, wî jî bihîstibû û kiribû tevî yen dine. Car cara bi mevanî diçûne qowîşa piçûk. Oda vvan betir raxistî û baş bû. Bîhna vve jî wisa ne giran bû. Giştan zanibû kü li vvedere

qumar te lîstine, esrar te kişandine. Le hemûyan jî, xwe dida nezaniye. Sergardiyane dilnerm jî zanibû. Hemûyan peren xwe distand û tu tişt nedidîtin. "Hukumat nikare vvan bîne râ, eze çi bikim" digot û pir li ser vî karî nedisekinî. Evv nivîsdare ser mezin jî, ji nav esrarkeşan kem nedibû. Biniya çaven vvan vverimî, niherandinen vvan bi mij û du man bûn. Caran bi merivanre xeber didan, le te digot ku di dineka di nede dijiyan. Bi şev gelek radizan û bi roj jî hetanî nîvro pal didan. So ro evv jî nas kirin.

Se çar rojan şûnde, gazî Soro kirin. Ew û sergardiyan tene bûn. Evv oda ku roja peşîn hatibûne, li ser lingan bûn.

Ehmed efendî, di maliyede memûre. Cîrane mine. Xortekîbaşe.

We silav dike. Kemasiyen vve dipirse. Ji hivîsdaren mehkeme bihîstiye, dibe ku van rojan, vve berdin,"digot. Ji yen dinere nebeje. Bira se re wî nekeve belaye.

Tu saxbî. Qet kemasiyen me tunin. Xwede ji te jî, ji wî jî razîbe.

1-16

Dema ku Soro we ji cem sergardiyan derketa der, wî sere xwe di rej kir û li dora xwe niherî. Kesek li vvan deran nedît. Bi dengekî nizm got:

Birazî. Guhen hevalen xwe bikişîne. Bira li zimanen xwe bibine xwayî.

We hejî bigota. Denge lingen hinekan bihîst, ji hevvşe. Gotinen xwe birî. Soro derkete der.

Bele eva edî rast bû. Gundiye wî awqas vir û derevv kiribûn ku gişt hatibûne bihîstine. Ji hale sergardiyan dihate xuyane.

Bîst roj derbas bû di girtîgehede, di nava çar dîvvarande bûn. Kes çavtirsiyayî anjî aciz nebûbûn. Di alîkîde jî baş bû ku ev der nas kirin. Ji hepis û girtine edî neditirsiyan; "Tirs hetanî ber ceme." "Ku te pişta

tirşe şikand edî netirse..." Heke ku girtîgeh evbe, heyfa vvan meriyan ku di hundirde dihelin û ji hepse hundirqetî dibin. Ma çi bûye? Dibe ku di girtîgehede mabûna vvan gelekî direj bikişande.Sibeke, li qowîşa din ya mezin, gazî du merivan kirin. Roja mehkema vvan nîn bû. Şeve ke dikanek şelandibûn. Nobedare sûke evv girtibûn. Ku çav bi deban ce ketibûn, mînanî kûçikan lava kiribûn. Le nobedar evv bernedabûn. Piştî nîvro tendûrekî, dest bi kelepçe di nava cendirmande birin cem savvcî. Nû, ji serîde her tişt dipirsiyan. Yek û yek diketin hundir. Di davviyede evv xorte ku bi viran pesne xwe dabû, gazî hundir kirin. Ji hemûyan zedetir di hundirde ma. Wexta ku derket, rûye wî di xwiyede sor bûbû. Ziman ziha, li ber xwe dinherî. Çû cem hevalen xwe.
Ez de û jina vvan... Dizen benamûs. Oelaşen küre qelaşan.
Soro û Mîro her tişt fem kirin. Savvcî evv şûnve şandin girtîgehe. Rojtira dine savvcî heft hevv ji vvan berda. Xorte fortek tene girtî ma. Qanûn vve deme avvha bû. Merivan nikaribû li hember van qeraran şîkat bike. Tendûrekî bîstûçar roj di girtîgehede mabûn. Di van rojande, gelek ji gundiyen vvan dihatin dîtina vvan. Di gund, çi dibû ji vvanre digotin. Evdo çar cara hatibû dîtine, hale vvan pirsîbû. Her ca rajî Soro û Mîro qedir, qîmete wî girtibûn. Bi kef û ken vvîre xeber da bûn.
Hatine berdane. Hevalekîxwe di hundirde dihiştin û düşikestî da ne ser re. Li ser riya xwe serîk dane xane. Bihîstin ku di günde vvande, xwaye traktöre hatiye kuştine. Ke kuştibû, nedihate zanîn. Her yekî ti ştek digot. Xeber saetek û dü saetan bere hatibû bajer. Mîro û Soro bi kijan alîde dinherîn, dîsa jî nikaribûn ji nav derkevin. Gelo ke ku ştibû?
117
-XXIICar

caran di hinek günden dost, caran di şikeften çiyande dijîn çer den van deran. Çiya hînî vvan bûn, evv hînî çiyan. Dosten vvane herî ne zîk ev çiyane. Caran jimaren vvan zede dibû, caran jî kem. Ji bo çi ku derketine sere çiyan, heke vvan tiştan texine re, evv jîji çiyan tene jer. Çend mehan di hepsede radizan û derdiketin. Di pey vvan, evv rojen tengasiyen û naven ku pey ketî, diman. Ev çilo dine ye ku eşqiyayen li sere çiyan jî, eðer xwe nesiperîne axakî, nikarin bisitirin û bijîn. Jiyana vvan her tim di xeterede, peçiyen vvan li ser tivinge... Dîsa jî be axa nedibûn. Evv eşqiyayen doste axayen bi nav, hevdu nas dikirin. Kî merive, doste kîjan axayiye... Levvra tu caran zirara vvan nedigihîşte axakî. Hetanî ku ji desten vvan te, tevî karen feqîran nedibûn. Ji ber cen dirman û qanûne direviyan. Gundiyan jî alîkariya meriven vveha diki rin, eðer ku ji desten vvan bihata.

Car caran cendirman diavete ser gundan, evv dieşandin û dikutan.

Ji bo ku vvan eşqiya xwayî dikirin û alîkarî didane. Gundiyan tiştek nedigot.

Zanibûn ku heke xirabiyek be sere eşqiyan, bizanibin ku vvan alîkariya cendirman kiriye, ve çare qaçax û eşqiya vve zor bidana ser gundiyan. We çaxe cendirman jî nikaribûn gundiyan ji desten eşqiyan xilas bikin. Mal, genim û gîhayen vvan vve bihata şevvitandine. Evven ku ji ber qanûne direvin vvilone. Heke ku tu bela xwe di vvan nedî, evv başin. Te ku evv dane dest, bela hanî sere vvan, edî ji tere xüasbûn tü ne. Ji derden vvan, edî tu nikarî sere xwe bilind bikî. Şev û roj vve li ta ra hustiye te suvvar bibin. We bîhna te biçikînin, mînanî maran di er dere bikişînin. Gundiyan evv rind zanibûn û nas dikirin. Levvra, ji xira-biyen vvan dûr disekinîn. Cerdan jî, ji bo ku zirara vvan negiheje gundiyan, bi dizîkave dihatin gundan û kemasiyen xwe dihanîne cî û diçûn.

îbrahîm û hevalen wî wisa bi nav û deng nîn bûn. Ji bo tirsa cane xwe dest pe kiribûn. Ne mînanî yen dine bûn. Her diçûn bedeng û te vî tiştekî xelqe nedibûn. Car caran poşman dibûn. Hevalen îbo, qedre vvî rind digirtin. Bi gura wî dikirin. Gotinen wî dianîne cî. Xirabiyen vvan tüne bûn.

Pişta xwe dabûne keviren mezin, ber tave, sipiyen kincen xwe dikûştin. Mehan bi kincanve raze, bi ava germ xwe neşo. Ye çi bibe? Qirçimen bin paşilen vvan, nav pizyen doxînen vvan, helîne sipiyan bûn.

Him pakiş dikirin, him jî hevre ketibûne henekan. Nîv tezîbûn, tave

118

cane vvan germ dikir û di dile vvande xwestinen dine dilipitin. Hemû yan li günde xwe dilketiyen vvan hebûn. Hinek bi şevan, ji bo ku düketiyen

xwere çend pirsan bikin, çiqas xeter dabûn ber çeven xwe. Ji ba jer savvûnen bi büýn, qutiyen krem, destmal dikiriyan û didan dilketi yen xwe. Wisa duşa dibûn. Te digot ku dine hemû ye vvane. Naha li ve dere, di nav vvande yen zevvicîjî hebûn. Çi zehmet kişandibûn, ku he tanî destgirtiyen xwe bibinin? Niha gişt dûr bûn. Him jî pir dûr. Di di le vvande xwestin tene hebû. Her tişt ji vvan dûr bûn. Xwestineke ku tama tûj dida deve merivan. Xazila niha li günde xwe, li cem xwastiyen xwe buna. Li cem zaren, jinen xwe... Çiqasîjî bîra vvan kiribûn. Hi nek caran qala serpehatiyen xwe dikirin. Yen duan û vekirîbûn. Digo tin, dikeniyan. Tişten qet nebihîstî, çiroken wisa digotin, meriv ji kena dimir. Hezkirina vvan, dilketîbûna vvan mîna gülen sere çiyan veki rîbûn. Xwe bi xwe bilind dibûn. Paşe qet bîhnnekirî diçilmisîn, hişk dibûn. Dilketina vvan bedeng, di hûndire vvande mînanî rîse bi güok mezin dibe, mînanî pelen behre quloz dibin, cane vvan diqijirînin û paşe vvinde dibin. We vvinde bibiya, filitandin tüne bû. Evîna eşqiyan

di nava bebextiye û hevvî anjî be ûmûdiyede te û diçe. Davviya eşqiyan naye zanîne. Levvra xwestina vvan, eyîna vvan jî mînanî köze eðir di bin xweliyede dimîne. Salen direj hedî hedî vve dihelînin. Car caran yek ji vvan nîv bi henek, nîv bi rastî:
Lavvo, xwede em ji jin û kare duan bepar hîştine. Ji bo ku ceze bide me, wisa kiriye. Heke ku piçek baruta vve heye, bihele vvan rojen fireh.
Li kedere dibin bira bibin, le eşqiyan nikarin tivdîran ji bîr bikin.
Ev qanûna vvane. Çiqasî vvestiyayîbin, di halekî xirabdebin jî, gere no bedariye bikin. Ji nişkeve di xewede bene girtin, ji bo eşqiyan ji miri ne jî girantire. Şev nîvî şeve bûbû. Ber ronahiya hîve, îbo nobedar bû. Hevalen wî di xewedane. Tvingen vvan hemezede, bi kincanve razayîbûn. Evvî jî nobed digirt. Xew nedikete çavan. Gund, mal û rojen te ne hatine bîra vvî. Eve avvha çavva bibe? Eme heta kînge li sere van çi yan, di hale kûçikande bijîn. Hela kane di bin kîjan kevirî, bi gulla cendirmekî
anjî bi ya yekî dine, eme bene kuştine. Kes miriye me jî hilnade.
Eme bibine xure teyr û mişkan. Genî bibin, kurme tekevin Ýaşe me.
Ji nişkeve tirsek kete dile vvî. Hatibû kuştine, tivinga wî li cem ketibû alîkî. Xwîn ji deve wî hatibû. Zike wî vverimîbû. Ev hatin ber çavan. Kurm tijî çavan bûbûn, guh û poze wî dbcvvarin. Teyr li ezmanan, do ra wî difiriyan û dizivirîn. Xwast ku van ji hişe xwe derxe, bavcje. Cixarek vexist. Şeveka henik û xweş. Hemû bûyeren Tendureke, bihîsti-
119
bû. Mîro, Soro hate bîra vvî. Evvşeva ku çûbû mala vvan. Dostî û hevalîke baş ji vvan dîtibû. Jina wî nanen male gişt anîbû, dabû îbo. Pener û fişek hatine bîre. Çiqas baş bûn evv. Ji nişkeve tiştek kete dile vvî. "Se re vvan feqîran bi axere, vve tekeve belaye. We rojeke li axe xin. Paşe

heta davviya emre xwe, rûye rehetiye nabînin. Mînanî me. Li sere çi yan. Ji me jî xirabtir. Me çi kiriye? Qet. Nasen me, meriven me hebin, em cima li van çiyan diminin? Herdere bibe cehenem ji bo vvan. Xwede bike ku kes dînitîke vveha neke."

Rabû ser piya, li der doren xwe meze kir. Evv teselî kir. Qet tiştek nîn bû. Meh û sal derbas bûbûn. Bûbûne meriven din edî. Di xewede, ji meşen difiriyan jî dihesiyan. Xewa eşqiyan bi navdare. Qet tiştek tunebe jî, di bedengiyede jî, di xewa xwede xetere fem dikin. Pir caran jî, texmînen vvan rast derdikeve. Şaş nabin.

"Evven ku awqas dostî û dibcvvastî nîşanî min dan, niha girtîne." He mûyan zanibû. Çûbû kedere, rastî ke hatibû, gişta digot ku axa evv avetine

hepse, erde vvan dajo. Evv benzin û tişten ku hatine şevvitandine jî qet kar nekiribûn. Hinek pere û male vvan çûbû. Ne zede bû evv jî. Kare axa niha ji bere baştir diçû.

"Dest û piyen min giredayî, mînanî kerguşkan bijîm. Feyde min jî negiheje tu kesî." Xaltiya wî hate bîre. Hingî çûbûn, qet tu xeberek je derneketibû. Careke ji yekî bihîstibû ku baş bûn û li Oonyaye dijiyan. Ya rastî kesî jî rind nizanibû. Xaltiya vvî, ji wî çiqas hez dikir. Çi dilekî germ û şîrîn le bû. Tişten xweş û rind dianî û dida vvî. Ji bo vvî, feqîre, xwe pirtî pirtî dikir. Pore vveyî bi henne, çaven vveyen delal hatine ber çaven îbo. îbo qet avvha diltenik nebûbû bere. Gelo bi xweşiya şeve, bi dûrketina ji dosten xwe, vvüo bû? Ji çibû? Anjîxaltiya xwe pir hezdikir û evv jî çûbû xerîbiye, ji vve bû? Anjî ji male, ji birayen xwe dûr bû? Bi gur û teyranre awqas dem tev dijîn, ji vve bû? Her çi dibe bira bibe. Demen wî yen bi diltenîkî bûbûn bere, le mînanî niha nebû bû tu cara. Çaven wî bi mij, poze wî bijan bû. Gevvriya wî dihate şidandine.

Oefesa wî teng û piçûk dibû. Rabû. Çend gav peşde çû. Mîz kir û zivirî. Çiqasî xîret kir ku hevale xwe hişyar neke, dîsa jî evv hişyar bû. Nobedarî hişt. Cbcarek da hevale xwe û li devvsa wî xwe direj kir. Rojtira dine vve tiving û çeken xwe paqiş bikirana û rûn bikirana. Paşe vve evder, qedereke terk bikirina, dûr biketana. Zanibûn ku li cîkî ze de mayîn xetere û beyûme tîne peşiya merivan. Eşqiya gerek li hinek ciyan gelekî nesekinin, vvan deran hez nekin, eva yek. Dostiya xwe bi eşkere nîşanî vvan gundiyen feqîr û dost nedih, ev dudu. Yek jî, xew mirine. Heke ku tu van neynî cî, tu li ezmanabî, dîsa jî tu nikarî bijî.
120
Evv eşqiyayen ku çaven vvan di namusa xelqedene, vvan bihele li alîkî. Evv zede najîn. Mirina vvan li peş poze vvane.
Li cem hev rûniştibûn, çeken xwe paqiş dikirin. Hevalekî vvan no bedar bû. Yen dine li erde rûniştibûn, him karen xwe û him jî henek dikirin. Gelek tişt didîtin ku li ser xeber bidin û laqirdiyan bikin. Te digot ku xezînen bebinî bûn.
Di deste îbode mavvzera wî hebû. Evv gelek hez dikir. Wisa le din herî, mînanî meriv li keçeke heyjde salî meze bike. Mînanî çaven xwe, mînanî cane xwe. Bere xwast ku mekanizme derxe. Hesine bin kişand. Deng derket, got "çit". Mekanizma ji cî dendst. Çep û rast le niherî. Şewqe xwe ji sere xwe derxist, danî erde. Mekanizma da ser şewqe xwe ku toz, xulî û qirş pe negrin. Meze kir ku mekanizma û ciye we baş bûn. Çek her tim leniherandine dbcvvaze, le mekanizma her betir gerek be meze kirin. Li cem xwe rûne tivingan qet kem nedikirin. Paşe namlî girt peş tîreje, li hundir meze kir. Bi qirej bû. Danî cem xwe. Ji berîka xwe rîsek derxist, ji mûyen bizina çekirîbû. Di serîde hesinekî piçûk hebû. Hine pîne û paçe paqiş peve gireda. Ji alîkî berda û ji yale namliyeyî dinede derxist. îbo rîs kişand, dendst. Pîne davviye qirej,

baruta hundir paqiş kir, bi xwere anî der. Careke din, evv tişt bi aliye dineve jî kir. Pîne guhart, rûne zirav teda. Dîsa di namliyede berda xware û aliye dinve kişand. Namlî hatibû rûn kirine. Ve çare bi pînenen paqiş ev paqişkirin ji serîde kir. Hevale cem vvî, tivinga xweya rûsîpaqiş kiribû. Çavekîxwe girtibû, ji namliye dinherî. Himjîxeber di
da.
Li cem me neçîrvanek hebû, gelek dijvvar bû. Qet vala nediavet.
Li vvan deran navdar bû. Ser vvîre neçîrvanî heram bû. Li hemberî ro je, tîrej bene çaven vvî, neyniken piçûk didane cîkî. Evvî nişan hildida û neynik pirtî pirtî dikir. Evvî car caran digot; "Namliya tivinge hatibe xwarine, evv tiving mînanî mere neçeye. Xera vve çeke tüne. Heke ku namlî gelekî bi rûnbe, evv jî mînanîjine düreqosin. Evv jî penc pere na kin. Xirabiya ku neke tüne." Ev gotinen vvî, kînge çekan paqiş dikim, ten bîra min.
îbo li aliye wî zivirîbû, guhdarî dikir.
Ji bo xwede rast gotiye. Herdu jî rastin. Paşe, ji bo ku rind paqiş bûye an nebûye, namlî da ber tîreje. Paqiş bû, hundire vve mînanî neynike
dibiriqiya. Ji bo ku rind bavver bibe, ji berîka xwe kaxizeka cbcare derxist, çar qat kir. Tiving kire nava herdu çîpen xwe. Mekanizma li jere, kaxiz hinekî bi alîkîde.xar, deste xwede girt. Tîrej da hundir û jorve le niherî. Di hundire vvede toz tüne bûn niha. Kare wî qediya bû.
121
Mekanizma ku li ser şewqe wî bû, rûn kir, kire cî. Fîşeng yek û yek ki re xezne. Mekanizma peşde şand û fîşeng ji jorve tepisand û hesine gulleavetine hilda aliye vala.
Paşe nan û pener dbcvvarin. îbo xwast, evv tişten ku di düe vvîdene, vvan ji hevalen xwere veke.

Oro, hevalno. Hûn van kirinen axaye Tendûrekere çi dibejin?
Dev û gepen vvan tijî nan û pener bûn. Pariyen ziha nediçûne je re. Hevale vvan Sînan, bi daqûrtandina pariyan zehmet dikişand. Em re wî ji yen din zedetir bû. Di nav xwede, jere "Ape Sîno" digotin. Salen vvî pir zede nîn bûn, le bele zû ji can û beden ketibû.
Çiye? Evv jî yek ji vvanen ku tu zanî. Te nebihîst, deh kes di hundirdene. Nive gund bela bû, çû. Yen mayîn jî perişanin. Dine bebexte.
Avvhaye.
Te bîra te, wexta cendirman dabû ser me? Çilo bûbû? Meji gün de vvan xwarin û fişek standibûn.
îbo, tu çi dibejî? We şeve me qira nan û pener anîbû.
Yen dine bedeng, him nane xwe dbcvvarin û him jî guhdarî dikirin. Pariyen xwe bi ave şil dikirin.
Bira evv kes avvha qir bibin? Feyde me qet negiheje vvan gelo?
pirsî îbo.
Nizanim... Walle bira di ve dinya bebextde, meriv nekeve di bintara re... Kes bi desten merivan nagire. Yen mîna me, be erd û be cî, ji ber qanûnan direvin... Feyde me hela he nagiheje me, eme ji bo vvan çi bikin? Em zirare didine dosten xwe, zirare.
Wisa nebeje ape Sîno. Zirara me güûştiye ke?
Nexeyde bave min. Ez ji bo xwe jî dibejim. Dile xwe neke. Bexte me, yen ku ji ber qanûne direvin avvhaye. Yen ku bi mere dostin, cendirme û axa her tim zorbetiye le dikin. Wan dieşînin. Zirar gotina min evve. Xenji ve çi zirara me bigiheje kesî, ez qurban? Heke ku cîkî em deste xwe bavejin hebe, çend meriven meyî kar ji dest ben hebin, çi karen me li ser van çiyan û baniyan heye? Ere beje, çi kare me he ye? Kîjan ji me li hemberî hukumate sekinîbû? Beje, çend kes ji me çend meriv kuştin? Kîjan ji me li peş hukumate serî hilda? De beje,

me çi kiriye? Ye me hemûyan, tişten piçûk û sivikin. Em tirsiyan. Em ji bexwayîtiye, bekesiye tirsiyan. Em tirsiyan ku gelek tişt vve bene se re me. Em ji girtine tirsiyan, ji lexistine û tedayiye tirsiyan.
Bele gitş jî rastin apo. Le dîsa jî dile min qebûl nake, yen ku ha tine sere tendurekiyan. Hale vvan ne tu hale.
Hela le. Hela le. Dile ke naşevvite?
122
Yek ji vvan li jer rûniştibû. Oemer, zirav û ji hemûyan civvantir bû. Ku kesî tiştek je nepirsiya, qet xeber nedida. Nan û penere mayî berev dikir, got:
Ez jî mînanî birake îbo, ji bo vvan dil şevvitîme. Belengazan ge lek züm û zehmetiye dikişinin. Car caran dile min dibeje, herim axe vvan bikujim. Bikujim ku gundîje xüas bibin.
Ape Sîno keniya. Paşe ji dil axînek kûr kişand.
Tu xortî lavve min. Qet axa bi kuştine xilas dibin? Tu wisa zanî, ne? Evv diçe küre wî te şûne, biraziye wî te, neviye wî te. Küre vviyî me zin, ji nihave dora xwe dipe. Lavve mini mencas, te xweş got... Le evv mînanî keçanin. Bi yek, dudu kuştine naqedin. Mînanî keçanin, mîna nî sipiyanin. Heke ku helînen vvan derman nekî, nekelînî, qet keç û sipî xilas dibin? Le evv avvhane. Hukumat bi vvanre naçe serî, tu belengazekî li sere çiya, te li vvan çi bikî?
Ape Sîno, meriven kîjan axayî di hukumatede tunin? Tu çi dibe jî, got îbo.
Le ez qurban, tu rind dibejî. Tu bi xwe dibejî. Ez jî wisa difikirim. Hukumat jî bi vvanre seredariye nake. Li her dere desten vvan he ne.
Evv xorte gava dine, dîsa kete nava xeberdane. Dihate xuyane ku ji van xeberdanan hez dikir. Cima dijî axan bû? Ji desten axa çi kişandiye?

Hevalen wî rind zanîbûn, levvra heq didane vvî.
Ji deste, ji gundekî dûr bû. Li gund hinek erde vvan hebû, ji bav û kalan mabû. Jiyana xwe pe dikirin. Evv çend mal bûn ku erde vvan kembe jî, ye vvan bûn. Yen mayî, ye axe bû. Axa xwestibû ku erde vvan jî bikire. Le kesî qebûl nekiribû. Ya rastî, paşe van çend malen xwayî erd, alîkarî û piştgiriya hev kiribûn, axa jîdevje berdabû. Careka din jî qal nekiribû.
Ji bo dil tu ferman û qanûn heye? Dile xorte me dikeve qîza axe. Evvren xeter li havvîrdora wî digrin û her roj giran dibin. Bave wî li peş disekine, "küre min her kes gerek çiye xwe bizanibe, here ber deren yen mînanî xwe, ev kes axaye, devvletiye û em feqîrin. Were me li er de nexe, paşe vve bi me bikenin", dibeje. Lavvik van giştan guhdarî di ke û heq dide bave xwe. Le çave evîne kor bibe. Di alîkîdejîkeçik xort tûj dike. "Ez dimrim dîsa jî naçime yekî dine. Tiştekî naxwazim, qet ti ştekî. Ne devvlemendî, ne tişt, ne jî kine. Tu ji çi ditirsî? Tu çilo merî?" digot.
Xort, di gura de û bave xwede, bi edeb û töre bû. Vîşuxulî dikole, davviye bernade. Dile de û bave damîş nade. Qîzike dbcvvazin. Wisa pi-
123
çûk dikevin, wisa piçûk dikevin ku xwe bi tengasî digihînin male. Ba ve wî mîna zarokan digirî. Küre xwere dide xeberan, diqehire. Le dî sa jî hersa vvîje kem nabe. Bi rojan nikare derkeve nav cîranan. Pirsen bave qîze dadiqultîhe û li rûye küre xwe nanihere. "Awqas sal bi rûmeta xwe bijî, paşe vvere piçûk bikeve û berûmet bibe."
Lavvik gelekî dübirîndare, ku bû sebebe van halan, ji bo bencvveketina bave xwe. Van qet deqîqeke jî bîrnake. Dbcvvaze keçike birevîne. Qîz dbcvvaze û evv dbcvvaze. Le, vve şeve, de, bav, xwûşk û birayen wî di hundire malede bûn, axe agir berî mala vvan da û şevvitand. Kes nika

re wî bide sekinandine. Cîranen vvan, vvan ji mirine xilas dikin. Dest û lingen diya wî dişevvitin, hetanî bigeheje hestiyan. Goşt û hestî je di kevin. Mâl bi tevayî dişevvite. Heyvvan li derve giredayîbûne, levvra evv difýlitn, tiştek bi vvan nabe.
Duman û alafji gund quloz dibe. Xort û dilketiya wî hela heji gund rind dûr neketine. Meriven axe, bi çek li pey vvan bûn. Qîzik xwe dave dest û piye vvî, lava dike.
Ez qurban, tu bireve, here. Evv, qasî ordîkene. Tu bi vvan nikarî. Binhere, mala vve jî şevvitandin. Tu vvan nizanî, zorbene. We te bi saxî bişevvitînin, biqelînin. Qurbana teme, lingen te maç dikim. Min bihele, bireve.
Qîze, cima tu dînî? Evv çito merin ku qîzan direvînin paşe didi ne desten beşerefan? Ez dimrim, dîsa jî te nadim vvan.
Neke, necirine. Tu bave min nas nakî. Tu nizanî vve çi bike?
Di alîkîde zenda vve girtibû, direviyan. Sivvar û peya ji gund derketibûn. Evv dûrve ferq kirin.
Ji tere dibejim ku here. Min bihele, here. Nikarin tiştekî bi min bikin. Haya diya min heye. Min ji vvere gotibû. Tu dizanî gund ji diya min maye. Levvra, vve min bikute, li min xe û bide çera. Paşe vve davviye berde. Ezji tere dibejim, bireve, here. Ez pirs didime te ku heta mi rine eze li benda tebim.
Paşe xwe dave bin lingen dibcvvestiye xwe. Qîza axe dest û linge vvî maç dike. Xort damîş nade, dilketiya xwe dihele û direve. Wî nikarin bi dest xin.
Wextek derbas dibe, dibihîse ku bave wî bi zarokanve çûne gunde kî dine. Cem merivekî xvve. Diya wî hildane nexweşxane û nîvcan ma ye. Levvra, ji hemûyan betir, dile wî bi tendurekiyan dişevvitî.
îbo xwestibû ku xort çay bikelîne. Denge wî bi dostî, biratî bû. Çay

vedbcvvarin ku îbo:
124
Binherin hevalno. Xwestineke min heye. Ez davviya me ne rind dibinim. Ji bo me, yen li sere çiyan dijîn, çiye? An gulla cendirmekî anjîgulla eşqiyakî dine. Avvha hatiye nivîsandine li eniya me. Her ke sek ji me ji bo derdekî, ji ber zorbetîke reviye, hatiye van deran. Jiyana me jîne tu jiyane. Her roj tirs û tel. Oirej û levvitandin. Westandin û kûvîtî. Xwede xirab bike ve jiyane. Feyde min negihîşte min jî. Ha le tendurekiyanjîne jiyane. Meriyan dihelîne. Ez gotinen ape Sîno baş fem dikim. Gişt jî rastin. Dîsa jî çi dibe bira bibe. Ez dbcvvazim Ûsiv axajidine rakim.
Bi can û dil guhdarî dikirin. Te digot ku hinek veciniqîn. Ji ber peşneyareke vveha hinekî şaş bûbûn. Baş anjî xirab dijîn û re diçûn. Di be ku xwede derîk ji bo vvan vekira.
Evvî gotina xwe nebirî û got:
Bele, em hemû li sere xwene, serbestin. Heke ku hûn dbcvvazin em koma xwe bela bikin. Çavva dbcvvazin bira wisa bibe. Ez bi xwe, eze herim. Biceribînim ku vî karî binime cî. Xwede an vve bide min anjî we bide Ûsiv axa. Dile min vvilo dbcvvaze. Qet yek ji vvan jî ne merive minin. Dbcvvazim ku bi kerî tiştekî bem. Evv herdu kesen ku vve şeve me hevdû dît û alî me kirin, vve jî bidîta, vve ye heq bida min. Herdu jî di girtîgehedene niha. Jin û zaren vvan birçî, gund hemû stuxarin niha. Ape Sîno qedeha xwe careka din jî direj kir ku tijî bikin. Paşe:
Tu merekî xasî îbrahîm. Xwede zane ku ez yen mencas hez di kim. Wexta dibe, bira yen wisa bin. Le bele, gerek meriv him bi aqilbe, him jî mencasbe. Min ji tere got. Bavver bike ku ez jî dbcvvazim. Le Ûsiv axaye here, Ûsiv axakî dine vve be devvse. Ye kü nû hatî, vve be tir zorbebe. Betir zalimbe. Meriv pey yen çûyî diðere, wexta ku yen nû

hatin, bave min. Tu mînanî nezanan xeber didî.
Ez zanim apo. Le dîsa jî, wisa dbcvvazim. Bira zirara min negiheje kesîji vve. Eze vî karî bi xwe bikim. Emji hevdû hez dikin û hurmetkarin. Heqe min tüne ku kesekî bavejime xetere.
îbrahîme xwarzî. Qet tu difikirî ku axa û beg bûne yek. Evven ku dbcvvastin xwîna hevdu vexwin, ji hevdû xeyidî, cane hevdu distandin, gişt bûne yek. Tu Zubed axa zanî. Niha doste Ûsiv axayî herî başe. Mî nanî biran. Na, na ji bira jî zedetir. Vî Zubed axayî bîr neke.
Çaven îbo diçirisiyan. Zanibû ku pirsen bene kedere.
Te qala Eşo bikî, ne vvisane? Cerda Eşo.
Bele. Bele. Tu zanî. Li van deran, ye herî bi nav û deng Eşoye.
Eşo di bin emre Zubed axadeye. Paşe eme çavva ji wî xüas bibin?
125
Raste. Dibejim ku herim, her tiştî ji Eşore bejim, pere xeber bi dim. Ma evvî jî zilm nediye? Ji bo dîlan û davvete nehatiye van deran! Ji ber xwe hatiye cima? Ji çîmere Tendûrek? Ne diya minin, ne jî ba ve min. Dile meriyan qebûl nake. Eze jere bejim.
Birayo. Min qet nizanibû ku tu avvhayî. Gotinen te başin, rindin.
Le. Bele. Le. Jiyana Eşo li van deran, di tengasiyede ji bajer xeber girtina vvî, li hemberî vvan tivdarek sitandina vvî, gişt giredayî çiye? Giredayî dostaniya hinek kesane. Evv xwe dispere Zubed axa. Ji bin emre vvî dernakeve. Gotinen te, vve li vir bimînin. Zubed axa jî hevvcî vviye. Levvra kes nikare dest direjî mal, milke wî bike. Ev kar avvhane. Bide û bistîne. Dine avvha bûye. Dineke qellaşe. Her tiştî meriv bi qelem, defteran dbce bave min. De beje, em Eşo nakine bela sere xwe?
Bele raste. We bibe bela. Min evva jî hanî bîra xwe. Min got ku dibe Eşo guh nede vî karî. Le gotinen te, he betir rastin ape Sînan. Waxta ku vviloye, eze pey vere sere xwe hildim herim. Dûrkevim. Ji

van deran gelekî dûr. Aliye rojhüat. Berve çiyayen herî bilind û tûj. Linge kesî le nakeve û teyr le nafirin. Ne eze kesî bibînim, ne jî kes min bibîne.
Tu di qula derziyedebîjî, vve ben û te bibinin. Tu heft qatîdi bi ne erdedebî jî.
Na lo apo. Cima evvana bûne çi? Kî dikare ku be çiyayen vvisa? Kî damîş dide? Tu nenihere meriven vvan yen ku bi peran girtine. Nikarinji paşilen jinen xwe derkevin. Evv, ji sere vvan zedetire. Yen ji ci yen xwenen germ, jinen xwenen nerm biqetin û herine mirine... Na lo. Hişe min hilnade.
Sekinî. Ker bû. Hevalen wî li benda qerarekî bûn. Te digot ku evve qerar nedin, hineken dine vve bidin. Heta niha qet tiştekî avvha nebûbû. Levvra nizanibûn, vve çavva bibe. îbo xeberdana xvve xwest bibire ûgot:
Ere. Bele. Davvî çi dibe bira bibe. Niha qerare min eve. Çi dibe jî ape Sîno?
Ourban. Hela bifikirim. Eze gaveke ji tere bejim. Tu zanî ev ne mînanî lîstika zarokane.
Le tu?
Evv xorte ku çay dihanî:
Ez bi tereme. Ciye minî ku ez herim jî tüne.
Ez jî biraye îbo.
Hevale vvanî dine, sere wî di berde, bi bende çarbca xwevc dilcyst. Bersiv bi vî teherî da:
126
Heke ku hûn destûre bidin, eze herim teslîm bibim. Hûn zanin suce min meriv birîndarkirine. Dibejin, cezaye wî ne geleke. Piştre ge lek wext derbas bû. Yale dine jî dev je berdaye. Levvra, qaseke peşde

herim, teslîm bibim, ji minre baştire.
Na lo, destur çiye? Em, tu, bi destûre hatine vira? Tu kînge bbcvvazî, dibe. Ev çiyan avvhane. Yek te û yek diçe
Le tene, xwastineka min heye. Roja piştî kare Ûsiv axa, kare Ten dureke hate cî, eze herim xwe bidim dest. Ne serme. Hûn zanin kesen mîna me, gerek xwe ji meşen difýrin jî biparezin. Şikkirin tiştekî başe. îbo fem dikir ku cima wisa dibeje. Gelekî duşa bû ku bi yekî vvilore hevaltî kiriye heta niha. Bele, gerek mînanî vvan şerpeze nebûya, xwe bida dest. Dibe ku bi cezakî kem xilas bibûya.
Ez ji xwe dikevim şike, le ji bo te, qet naye bîra min. Wan tiştan ji hişe xwe dence. Gerek tu îro, him jî lezekî şûnve herî. Tivinga xwe bide cîkî bi îtbar. Dibe ku rojeke kerî te be. Paşe here teslîmbe. Em nizanin kînge û çavva eme vî karî binine cî. Tu ji riya xwe şûnve nemi ne.
Ji berîka xwe pînekî qatkirî dendst. Ji nav, hinek pere dendst û da vvî.
Hilde vana. Kerî hemû kesan dibin. Tu girtîgehe nizanî. Peren te ku tunebin, bizanibe ku bend di hustiye tedeye... We deme te po şman bibî ku cima te xwe da dest.
Paşe çi hate bîre, hine pere dîsa daye. Ape Sîno cbcara xwe dipeça û kaxiz bi zimane xvve şil dikir. Li vvan niherî. Kelo girîbû. Diltenik bû. Mînanî bavekî ku dema lavven wî tişten baş dikin, wisa dibcvveş bû. Ev îbo, ya rastî, xortekî bi dile te bû, got bi xwe xwere. Dilen avvha bi kem kesanre hene. Yen ku bi vî tehrî bifikirin, kemin niha.
Biraye îbo. Biraye îbo.
Denge wî lerzok û mînanî bavan bû. Nerm û deng dida heta dile meriyan.
Min bibaxşîne. Cara dibejim bira, cara dibejim birazî. Caran jî

xwe şaş dikim, dibejim lavve min. Ez ne civvanim. Le bele hela gelek rojen min hene bi jiyane. Dile min dibeje, ku meriv ku hevaltiye dike, gerek bi yen baş, bi dil, cameranre bike. Dile min qebûl nekir ku te te ne bihelim. Hema kî der zirave, bira ji vvedere bişke, lavve min. Ez jî heme ji vî karîre. Hela bere em vî biraziye xwe bi re bikin. Paşe eme bifikirin.

Çaven tijî hesir, dilopek, dudu dihate xare. Hevdu hemez kirin û ji hev qetiyan.

127

Oxira te xerebe. Riya te vekirîbe. Li xwe baş meze bike bira.

Careke din jî nekeve van riyan, birazî!

-XXIIIDi

bintara çiyakî, nav daren piçûk û pirparede sekinîbûn. Bîhna xwe distandin. îbo ji ye cem xwere:

Here nobedariye, got.

Xort vvestiyabû û behemdî xwe bersiv da.

Bira, kî te van deran? Çi zirar heye?

Ev çito pirse? Tu difikirî ku kes nayen van deran. Le em çavva hatin? Yen dine jî dikarin ben. Evv cima nayen? Heke ku meriven mî na me, bi sere xwe tenebe, gerek qet raneze. Ku dudubin, dor bi dor. Tu hevv zanî hesane ev jiyan?

Xort şaşiya xwe fem kir. Ker û bedeng, ji vvan vvede, berve kevire kî çû.

We di nevvaleke tengre derbas bibana. Ronahiya hîve hebû. Seki nin. Bere Sîno derbas bû. Bi destan îşmar kir. Yen dine, bi dor, hemû çûn ale dine. Oedereka mezin re hüdabûn nû. Di nava Tendureke û Kanîsipiyede bûn. Di nava herdu gundande, di nevvaleke kürde bûn. Di evv riya ku diçû çiye, aliye raste, li pey hev berjer diçûn. Lingen vvan

dişimitîn. Yen ku çarbcen vvan qul bûn, kevir, qûm diketine nav tüyen vvan. Keviran lingen vvan dibirî. Nezîkî gund bûn. Hela he hîv neçûbû ava. Denge çend kûçikan dihat. Xwe telandin. Bi sebir di ciye xwede man. Denge kûçikan hatibû birîne. îbo evder baş nas dikir, levvra li peşiye bû. We li heviya avaçûyina hîve bisekiniyan. Hema hema hîv li ser avaçûyine bû. Çaven hemûyan li hîve bûn. Hîv bi lez diçû, paşe nehate dîtine edî. Her der bû tarî. "Cbcare kişandin, kibrit v&riştin tüne" gotibû îbo. Riya nava gund hîştin. Bi erdeve, çalepîkan berve pişta baxçe Ûsiv axa bûn. Li vve dere careka din jîji hevdûre gotin. îbo û Sî no, vve xwe li erde bikişandana û biçûna male. We li oda ku axa le radize, binherin. Heke ku li vvir bû, vve gülle berdane û bikuştana. Na eðer ku axa nedîtana, we vegeriyan û bihiştina careka dine. We deme, hevalen civvan, çek di destde, vve hazir û li benda vvan bibûna. Heke ku xeterek çebû, hinekan gülle berdana hevalen vvan, vve bihatana alîkariye.

Na, ku kar baş biçûya serî, ji bo ku hevalen vvan şûnve birevin, vve di ser xaniyanre agir bireşandina. îbo û Sîno ku xilas bûn, evv jî vve

128

biçûna û di berbanga sibede, ciye ku bere kifş kirine, li vve dere vve bigîhiştana

hevdu.

Kembe jî, dîsa qederek tavvetî û tirs bi xortanra hebû. Le kare gi ran cima neketiye para vvan, levvra ber xwe diketin. Dîsa jî fem dikirin ku di kare avvhade, her tişt qasî hevdu giranbihaye. Her alî jî vvekî heve. We alî îbo û Sîno bikirana ku evv birevin. Di meraqede bûn, şike de bûn. Ji hemûyan zedetir jî îbo. "Le evv be namus li mal nînbe?" Zanibû ku evv di oda mezinde radize. Heke ku mevane wî hebin, li

cem vvan paldide. Mevan ku tüne bin, bi jina xweve dîsa li vve ode radizen.
Ax, min Ûsiv axa ji paşila jina wî dendsta û bi guleke vvalgeranda.
Çi dibû bira bibûya. Ax çi xweş dibû, got di ber xwede.
Denge kesî tu li hemberî Ûsiv axa dernediket di gundde, levvra axa gelekî dükef bû. Cîranen vvan ku hatine girtine, gundî mînanî keviran besevvt bûn. "Wisa te xuyane ku vvan benamûsan gund xirab dikirin, tevî hev dikirin" digot axa. Levvra bi kef bû. Qet kesîjî edî mala wî nediparast.
Kûçik hîn kiribûn, piçekîji male vvede li cem gom û tevvlan disekinîn. Gelek caran diziya heyvvanan dibû, lema avvha hîn kiribûn. "Yek tene ü ber malebe, beşe". Kûçikekî mezin, meriv perçe perçe di kir. Evv jî li cem yen dine, li ber gome bû. Wisa kifş dikir.
Qet tiştek li ber derî nedihate xuyane. îbo, Sîno bi nezî hev, bedeng xwe erdeve zeliqandî, çalepîka çûn û li ser sürere bazdan. Hatine ber dîvvare ode. Yek li peş û yek li paş. Xwe bi dîvverve zeliqandî, hedîka heta ber pencera oda ku yale xermana, baxçe dinhere, hatin. Yekî, ye din diparast. We bi hevre gülle bireşandana hundire ode. Çaven vvan her tişt ji hevdû ferq dikir. Hînî tariye bûbûn. Di tariyede merivek pir hesan dijbartin û didîtin. îbo sere xwe hedîka direj kir, le niherî. Li se re odeyî jorîn, du cî li cem hev raxistîbûn. Xwe şûnve kişand. "Wisane ku mevane wî heye" got. Dîsa meze kir. Tivingek di dîvverde dardakirîbû, li ber sere evve ku li ber dîvver razabû. Gelo kîjan Ûsiv bû? Ne dbcvvast deste xwe di xwîna kesî bide. Tekeve bin guneh û xwwîna ye kî dine. Ne xwede qebûl dikir û ne jî tu kesî. Nikaribû Ûsiv axa di ta riyede, di nava cîde nas bike. "Mevan gerek ye ber dîvverbe" fikirî. Xwest ku gullan berde ye dine. Bi dengekî nizm ji Sînore jî got. Sîno sere xwe hejand ku beje "bele". Herdu bi hevre nezî pencere bûn.

Nîşan hildan. Agir kirin. Ye di nava cîde rabû. Li ser teeleke ket. Dî sa xwast ku rabe ser çokan. Gulleka nû evv velezande erde. Ye dine xwast ku xwe direjî tivinga bi dîvverde dardakirî bike. îbo agir kir ber ve mile wî û dîvver. We leze şûnve zivirîn. Kare vvan du, se deqîqan jî
129
ne kişandibû. Şûnve direviyan. Ji yale baxçe, gülle di ser malere deng didan û diçûn. Ji male jî, paşe çend deng bi çekan agir kirin. Paşe her du alî jî bedeng bûn. Pey vvan denge kûçikan, caran nezîk û caran jîji dûrve dihat.
Gundî hemî hişyar û li ser piyan bûn. Der, dor nişkeve mînanî çe neme bûbû.
Xwaye traktöre xistine. Ji Oeyseiye hatiye ku serîkî bide trakto ra xwe. Lexistine, kuştine. Deste Ûsiv axa jî birîndare. Ke lexistiye? Oeyseriyo, begune û besûco.
Were mevantî, paşe qet be serî û be tüne, here can bide. Hela le. Hela te jî roja hatina xwe dît, evdale xwede? Teye ji bo çi traktör bipirsiya? Çi bikira?
Ber mirina wî diketin, le gelekî hersa vvan ji Ûsiv axare dihat ku bû sebebe mirina vvî.
Xazila Ûsiv axa bimira. Wekî evv bimira, vve her baş bibiya.
Hetanî xeber şandine bajer, wexteke direj derbas bû. Savvcî, doxtir, qumandare cendirman, nivîsdare vvan bi du cendirmanve hatin gund. Mirî, li ser cî, bi çarşefeke hatibû nbrimandine. Nivîn mînanî gola xwîne bû. Li derdore, xwîna hişk û zihabûyî hebû. Doxtir çarşef bi lind kir. Yekî, ne kin û ne jî direj, hevvekî tijî û qelew, ruye wî gilover, hestiyen ceynokan piçekî peşde derketibû. Ruye wî spîçilokîbû. Doxtir her deren wî meze dikir. Ji kincen wî bigre, heta muyen ruye vvî, gişt dan nivisandine. Devvsa çar gullan hebû. Du hevv li zike vvî, yek li

çîpe, yek jî li aliye çepe bin çiçike wî ketibû û di pist pîlen vvîre derke tibû. Bi çi teherî, çavva hatiye kuştine, eşkere bû, le dîsa jî otopsi çekirin. Li peş male cîkî bilind hazir kirin. Hine dar dane ser. Cinaze li ser direj kirin. Doxtir di destande lepiken lastik, bi keren mezin kete Ýaşe mirî. Mirî perçe perçeyî kir. Qefesa wî vekir. Gulla ku di qefesere çû bû, dile wî qul kiribû. Zike wî vekir. Bi se çar ciyan ruviyen wî qul bû bûn. Bîhneka giran û ne xweş je dihat. Çi bidîta, dizivirî û dida nivi sandine. Paşe bi takî qalind, zik û qefesa Oeyseriye mirî dirût û girt. Niha edî hûn dikarin miriye xwe hildin.

Doxtir du se cara dest û zenden xwe şûştin. Deste Ûsiv axaye peçandî vekir. Her peçan vekirinede Ûsiv axa, ruye xwe dipirçiqand.

Deste wî pir dieşiya. Deste vviye raste, peçiyen çara û pencan ji kokede firya bûn. Evv jî dane nivisandine. Xwîn hatibû birîne, le birîn paqiş nîn bû. Ji nihade dest bi vverimandine kiribû. Bi ava nîv germ, bi rîn şûşt. Ji qutîke hinek derman dendst, birîn rind paqiş kir. Toz pe

130

reşand û dîsa peçand. We deme, mezin, piçûk gelek meriv kom bû bûn, van bûyînan meze dikirin. Çaven xwe qet ji doxtir dûr nedbdstin. "Gelo ev di hundire merikde li çi diðere?" digotin û meraq dikirin. Bi ve niherandine, güne vvan pe dihat, bîze vvan diçû. "Ev ji yekî mirî çi dbcvvazin? Miriya jî rehet nanelin. Perçe perçeyî dikin. Cima, ne gü ne- ye?.." Bi kelen mezin, bi bend û tayen qalind.zike mirî dirûtibûn. Gundî şaş û metel mabûn.

Savvcî, gotinen mbrter, nobedare gund, küre axa ye mezin û Ûsiv axa guhdarî kir. "Na saet çend bû? Te çavva bihîst? Paşe çibû? Deng, bere ji kîjan alî hat?" Tişten avvha dipirsiya. "Çend kes bûn? Bi kîjan alîve reviyan? Gelo kîbûn?"

Nivîsdar, peçiyen wî mînanî makîne zû dişuxulîn. Çend rûpel tijî

kir. Di davviyede qerar dan ku telgrafe bikişînîne Oeyseriye. Güne bû, mirî nikaribû zede bisekine. We bîhn biketaye. Ya baş, gorkirina mi rî bû.
Yen hatî, şûnve zivirîn, çûn. Ûsiv axa qet negot ku "sika min diçe fi lan kese". Sûc neavete hustiye kesî. Ya rastî jî ev bû. Hinek ji gundi yan di girtîgehede bûn. Ji bo yen dine, çi beje?
Mele gund, yen ku ji Kanîsipî, ji Zîlane hatibûn, Zubed axaye Qesroke û yen dine, Ýaşe mirî şuştin û rakirin.
Savvcî zanibû ku tu gunehe vvan bi ve bûyereve tüne, le dîsa jî po şman dibû ku cima evv heft tendûrekî berdabû îro. Qaseke din jî bise kiniya, betir baş dibû, digot bi xwe xwe. Paşe, piştî çend deqîqan, "ya rastî evv bû ku min kir" digot dîsa.
Traktör piştî rojtira dine vve dîsa kar bikira. Hetanî Ûsiv axa hat, küre vvî, ye hişyar û çavvekirî, li traktöre miqate buya. Him jî bikaribaya hinek tiştan bibihîse û hîn bibe. Waxta çûyîne, bave vvî, evv kişande alîkî:
Çi dikî bike, tiştna hîn bibe, got.
-XXIVSoro,
Mîro û hevalen vvan tişten xwe li hespekî hûrik û jarik kiri bûn. Dema ku gihîştine gund, xelq ji goristane vegeriyabûn. Di rede rastî savvcî, doxtir bûbûn. Savvcî evv dabû sekinandine. Teme kir ku kînge ban kir, yen bihatana cem vvî. Gundiyen vvan xeber sitandibûn ku evv hatine berdane. Ev bûyîna ne hişt ku gundî bi dilşayî herine peş heval û cîranen xwe. Tu kesen vvan nehatibûn bajer, ku alî bikin û pe-
131
şberbin. Ya rastî jî evbû. Betir rehet hatibûn gund. Çend quriş peren vvan ji bo hespe çûbû. Evv jî ne zede bû.
Oedereke ji gund der, gundî çûne peş vvan. Düşabin an jî bencvve

bikevin? Herdu jî, ji desten vvan nedihatin. Bencvve diketin ku tiştekî ku vvan nedbcvvast, bûbû. Li alîkî din jî, kî çi dibeje bira beje, ji dûrvebejîvve
ji tendurekiyan teketana şike. Le qet xebera yekîjîpe tüne bû.
Dilşa bûn. Gundiyen vvan yen ku hemû cîran ji vvan dibcvveş bûn, nezî kî meheke, besûc, begune di hepsede bûn. Niha evv jî hatibûn û di nav vvande bûn.
Bele, piştî mehekebe jî, niha bi hevre bûn. Deste mezinan maç ki rin, şekir kamfet dane zarokan. Her çûn, yen ku peş vvanve dihatin ze de bûn. Mirina xwaye traktöre ji bîr kiribûn. Bi meriven xweve herkes çûn malen xwe. Fate deste küre xwe girtibû, evv jî hatibû peşiya yen ku ji hepse derketibûn. Soro, Mîro û yen dine bi qedir, qîmet hal, kefe Fate pirsîn. Şekir dan küre vve. Ji alîkîde hemû bekef bûn. Ji bo ku evv xorte gundiye vvan di hepsede mabû. Diya wî li çoke xwe dbcist. Rûye xwe pençerûk dikir û pore xwe dirûçikand. Bave wî bedeng û dilşikestîbû. Denge diya wî quloz dibû. Digiriya û kine mince xwe diqelaşt.
Paşe he jî peşde çû.
Waye, vvaye. Ev çito günde? Çito gundîne? Küre min di hundir de hiştin û hatin. Şerm nekirin, fedî nekir in, hemû tişt avetine hustiye küre min.
Çendekî disekinî û dîsa dest pe dikir.
Way küre minî be aqü. Way küre minî nezan. Binhere, tu çavva di hundirde hiştin û hatin.
Soro bi vî hale vvanî düşikestî, nikaribû beje ku vir û pesndayina kü re vvan ev karan anîbû sere vvî. Bi sond û qeseman caran kir ku evve jî di rojen nezîkde be.
Çend roj derbas bûn. De, bave wî û gundî, bi ya rastî hesiyan. Diya vvî edî gilî û gazin nedikir. Zû zû xwarin dişande girtîgahe.

Hemû besevvt û bedeng bûn. "Ke ev merika kuşt? Cima kuştin? An jî bi şaşî, devvsa Ûsiv axa hate kuştine, feqîre feqîr? Xwede zane. Xenji vvî kes nizane..." Ev pirs roje sed caran dihataine gotine û cara kiri ne. Evv herd peçiyen Ûsiv axa ku çûn, hela di roja peşinde nave vvî, "Ûsive koppo" mabû.

132

-XXVPiştî

çend rojan, merivekî mînanî memûran, xwendiyan hate gund. Kamyoneka piçûk pere bû. Yekî din jîbi vvanre bû. Di davviya kamyonetede, du tabut jî bi xwere hanîbûn. Ûsiv axa li mal bû. Rojeke bere hatibû. Küre xwaye traktöre ji Oeyseriye hatibû ku Ýaşe bave xwe bi be vvelate xwe.

Me bave te vvek döşteki, vvek birakî hilda, gor kir. Qedera wî avv ha bûye. Were, wî rehet bihele, ji vir nebe, got Ûsiv axa.

Na xer, ez bave xwe li vir nahelim.

Ez te fem dikim. Tu bencvve dikevî. Tu rastî. Xwede axa wî zede bike. Ferq nake. Hemû jî erden xwedene. Ha evder, ha evvder.

Mevan bi pirçî bû. Dihate xuyane ku xenji mirina bave xwe, tiştek nedifikirî. Bave wî besûc hatibû kuştine. Levvra gelekî diqehirî.

Çi güne wî hebû? Serde, li nav meriven ku evv kuştin, bihelim.

Mirin li peşiya me hemûyane. Li eniya wî avvha batiye nivisandi ne. Kî dikare nivisandina xwede biguhere?

Cima bi qedera xwe nemir? Ke evv tevî van karen xeter kir? Tu ninî? Paşe, bele paşe, ma evv ne mevane te bû? Tu zanî gund hemû dijmine teye. Te cima evv hişyar nekir, şûnve neşand?

Ev çiye? Ev çiye? îca, di mirina bave tede, güne min çiye?

Le güne keye? Sûce keye? ,
Mele gund hate cem vvan, bi nermik nermik dest pe kir. Ji misümantiye qal kir. Qala çend pexemberan kir ku li ser çiyan, di riyande miribûn. Li vvan deran hatibûne gor kirine. Xera van peyivan qet ne bû.
Gundî tiştek tenedigihîştin. Çavva meriv goran vedike û miriyan di be cîkî dine. Heta niha qet nedîtibûn. Qet kesî jî qal nekiribû. Hezkirin, hurmeta bavan cima avvha dibe? Di bin erdede jî rehetiye nadine merik. Bi erde me qaîl nabin ku miriye xwe le nahelin. Gundî düşikestîbûn. Ji mirîre hürmet kiribûn, bi qedir, qîmet gor kiribûn. Küre wî dbcvvast, bave xwe di nav vvande nehele. Eva ji gun diyanre giran dihat. Gelek ji vvan neçûne cem. Mele û se çar kes li vvir bûn. Kefýnekî nû li mirî peçandin, paşe kirine tabut.
Traktör jî bi xwere dibir. Şoferre xeber da û teme daye ku vve biçû na. Xirabî û başiya ve dere gişt jî, bira ji Ûsiv axarebe. Heta niha kar kiribû traktör, evva hesab kir. Ji Ûsiv axa xwast. Ûsiv axa bedeng, mî-
133
nanî yekî ku sûcekî mezin kiriye bû. Nedbcvvast û nikaribû tiştekî be je. Deste wî ye raste peçandî, bi vî halî vvekî tiştekî mezin bûbû. Ji bo ku neeşe, di hustiye xweve darda kiribû. Li hember nesekinî, peren ku evv dbcvvaze, dendst daye.
Kamyonet û traktör li pey hev ji gund derketin. Ruyen vvan bi pirçî, nedbcvvastin li kesî binherin. Evv li cem şofer, cbcara wî di destde, zivirî li cinaze bave xweyî di davviya kamyonetede niherî. Hersa wî ji Ûsiv axare dihat.
Be namûse benamûs. Evvî jî hat em dîtin. Bave min dît, digot.
Paşe xwe nedigirt, dîsa digot:
Ji bo qedre xwede, qet di ruye vvîde xer heye? Hela le binhere.

Gülle ten peçiyen wî dikevin. Min deve te gülle no. Cîkî dine nizanî cima?
Jan û eşa deste wî zede bûbû, du hevv dendst, bi aveve daqultand Ûsiv. Perişan bû. Qet hevî nedikir. Nişkeve derd û belan pe girtibûn. Xelqe çi beje? Mirina mevane wî qet ne baş bû. "Peçiyen min çûn. Min pe tiştek nedikir, le dîsa jî, ji vir ha deste min nîvciye. Merik eşedbilla ji Oeyseriyeye. Kafir. Li hustiye min sivvar bû, awqas pere jîji min sitand. Ev çibû, hate sere min? Ez ji ku tevî van karan bûm. Ax, çi xweş dibû, vvekî mîna bere bima. Te digot derzî di minre diçûn. Min çû be la xwe di gundiyan da. De bikişîne niha. Hela bisekina, te he betir bikişînî ji desten vanan..." digot bi xwe xwere.
Gotinek digeriya di navbere û der dorande. "îbahîme eşqiya. Cerda îbo, ev kara kiriye", digotin. Ûsiv axa ne îbo nas dikir, ne jî evv dî tibû. Xaltiya wî ji vî gundî bû. Di piçûkiya xwede careke, duda hatibû gund. Paşe gotin ku evvjî bûye cerd. Dayin û standina wî pere tüne bû. Ne bi xirabiya vvî, ne jî bi qenciya vvî, kare wî pere nîn bû. "Cima îbo dîn bûye? Har bûye?" Şaş û metel ma tede.
Her diçû ev gotin betir dihate xeberdane. Ji tehrekî dikete tehrekî dine û paşe dihate ber guhe Ûsiv axa. Gişta jî digot ku "xwaye traktö re di devvsa Ûsiv axade hatiye kuştine." Ûsiv axa jî ev yeka zanibû. Beşik zanibû ku vvisaye. Le nikaribû avvha beje. Merik ji bo xatire vvî, di gorede bû niha.
Savvcî, cendirman jî ev bihîstibûn. Evv jî li pey îbo bûn. Çiya û banî nehiştin. îbo qet li cîkî nîn bû. Gelo kete bine erde? Çibû? Firiya ge lo? Cendirme le digeriyan û gotinen nû derdiketin her roj. "îbo lexistiye, ji nav heyşt cendirman filitiye û reviye. Xwe ji riya min vikişînin, kare min ne bi vvere ye, bi Ûsiv axareye, gotiye îbo..." Ûsiv axa ku ev

dibihist, roje çend caran dimir û dîsa dihate ser xwe. Her şev li cîkî di ne radiza. Mînanî kergûşkan.
Li vî gundî dîtine.
Roja dine:
Li vî çiyayî, şewqe xwe daye alîkî û kilam gotiye. Çend kesan bi çaven xwe dîtine.
Cendirman rehetî nedidane evv günden vvan der doran. Kevir û kuçik geriyan. îbo qet li cîkî nehate xuyane. Zubed axa ji Eşo bihîst ku îbo ev der terk kiriye, çûye. Ev xebera gîhande Ûsiv axaye doste xwe. Nedihate van aliyan edî. Li gelekî dûr bû niha. Çûbû cînen wisa ku lin gen tu kesan nedigîhişte. Ji tirsa Eşo. Ûsiv axa piçekî bîhna xwe sitand. Ev tişten ku bihîst, ji kesîre negot. Bira cendirme hema usa le bigerin.
"Le vvekî Eşo jî xapandibin? Le Eşo ku derevv bike? Qet îtbara meri ven avvha heye? îro dostin, le sibe dijminin yen vveha."
Lo îbo, îboye cerda sere çiya. Bedîn û be îmano. Min di dinede rûçike te nedîtiye. Xirabîke min negihîştiye te. Tu vvere mirina min bigere.
Lo lavvo, qet xwede qebûl dike? Xwede ve li cem te dihele ci ma? Ke dîtiye ku neheqî li erde dimîne?
Li gund, hemû kes di kar û bare xwede bûn. Rojen ku dihatin, derd û kul bi xwere dihanin. Wilo difikiriyan. Tiştek nehatibû guhartine, xenji belengazî û betamiya ruyen vvan. Zeviyen bere, hinek ji vvan Ûsiv axa ajotibû, yen dine jî vala û neajotî diman. Gîhayen bi kelem û merjorikanve
tijî bûbûn. Zeviyen nû tera kesî nedikirin. Bi zehmet, tene tera xwarina roje dikir. Evv jî nîv ter û nîv birçî. Zevî kem bûn. Meriv gelekî didane vvestandine. Ji zeviyan hetanî xermana kişandin jî zehmetekî

giran bû. Axa jî vvisa. Kar bi dile wî nediçû. Ji belayeke xilas dibû, le belake din dihate peşiye. Nav du sala, traktör, benzin, mazot hatibû şevvitandine. Xwaye traktöre hatibû kuştine. Hela ka kînge do ra wî dihat? Evv zeviyen ku payize ajotibûn, vve biçanda. Heke ku trak tora wî bi xwe tunebe, nedibû. Gerek reyeke bibîne, traktoreke bikire. Evv xorte ku di girtîgehede, hate perçiqandine. Gelek tengasî kişand. Hemû kesan, kevir û kûçikan jî digot ku evv bûyeren Tendu reke îbo kiriye. Savvcî, hakim, qumandare cendirman jî bihîst. Kesî riya îbo ser rast nekir. Hemû xeber jî bi hevdu nedigirtin. Ne mînanî hev bûn. Hinekan digot ku "çûye sere çiyayen wisa ku qet re nadine kesî." Hineken jî, "çûye çiyaye Maziye" digot. Çendan jî digot ku "çûye evv günden ku dosten vvîne."

135

Peyketin, ger û avetina ser gundan be feyde bû. îbo çûbû, gihiştibû ciye xwe. Paşe hedî hedî, li pey îbo ketin û gerandin kem bûn. Bûye ren Tendureke jî, ketine nav evv bûyeren ku ye kiri nedihate zanîne. Girtî hemû, di wexteke kinde fem kirin ku wî xortî peşin dabû xwe. Levvra şiltax avetibû bi xwe xwe. Her tim digot ku "min vveha kir, min vveha kir. Nizanim min çi kir..." Her hefte de û bave wî dihatin dîtina vvî. Şîreten Soro jere digotin. "Bira li zimane xwe bibe xwayî. Zimane xwe bigre." Caran qebûl dikir, caran jî diqehirî xorto.

Evv tivre sor jî kiye, ku şîretan li min dike?

Wisa nebeje küre min. Ji bo te dibeje. Cima xûlî dibî. Binhere, pere jîji tere şand. Tu silav dikirî.

We deme savvcî, ji girtîgehede hîn bû ku evxort newxaşe ku peya û pesina dide xwe. Vira dike. Bavveriya wî hat. Bele, ilm jî wisa nedigot cima? Hineken wisa derevv dikirin, vvekî ku ev bûyer di sere vvande derbas bûye. Ev jî nexweşîk bû. Yen vveha, pire vvan, ji bajaran, xwendî

û nîv xwendîbûn. Ev jî yekî mînanî vvan, le gundî bû.
Hemûyan her tişt ji îbo zanîbûn. Ji vanderan dûrketina wî jî vvisa nişan dida. Evv herdu dizen ku xort ûcbar kiribûn, savvcî evv careke din guhdarî kir. Wan jî got ku tu pirsen wî bi hevdu nagirin. Derevvan di beje. Savvcî evva di hundirde negirt û berda. Niha evv jî li gund bû. De û bave vvî, ji eşqan, lingen vvan erd nedigirt. Evv dîsa vvekî bere. Şevvqe dida alîkî, li ser çave xwe, bi jorve li hevalen xwe dinherî. Piştî girtîgehe, niha betir peya dida xwe. Li kedere rûdinişt û radibû, qala ro jen xwene girtîgehe dikir. Heke ku kesî nizanibûya, vve bigotina ku bîst sala di hundirde maye. Li vvedere, li çend kesan xistibû, xwede zane. Hemû gundî her betir feqîr bûri. Ter kamaş nedidîtin. Ji bûk û qîzanre kincen nû nikaribûn bistînin. Bi yen kevnve dijîn û evv pîne di kirin. Meriv renge şale meran edî nas nedikir jî pînan. Zarok jî tazîbûn. Ji bo ku piçek ka û genim nexwin, deven heyvvanan giredidan, li xermanan. Zarok li ser karnen xerman, zikvverimî, çîpzirav, çaven vvan ji toz û kaye nedihate xuyane, tene diçirûsîn. Te pifkira, vve li erde biketana.
Ûsiv axa, rojen xweyen xemgîr bîr dikir caran, li gund dinherî, rchetîk dikete dile vvî. Hinek ji evv malen li gund mane, ji pirsa wî dernediketin û bi dizîkave dihatin pere xeber didan, le kem bûn. Hale vvan xirab nîn bû. Yen dine tazî û nikaribûn dûr û direj vveha bijîn. Evve jî biçûna. We çaxe Ûsiv axa vve betir dibcvveş bibiya.
Ya herî baş evv bû, ku ji xwere traktorek bikiriya. Her tişt hatibû guhartine edî. Hukumate genim di hundirde nedirizand. Ji bo ku rind
136
kar bikin, zede genim û çandine bistînin, bi deyn û krediyan traktör dida yen ku xwayî erdin. Banqa çandine û daîra haceten çandine ge lek alîkarî dikir niha.

Gundiyan jî bizanibûna ku edî reke dine tunebû. We bavveriya xwe vvinda bikirana û yen mayîjî vve biçûna. "Ya herî baş evve" difikirî Ûsiv axa. Mirteza jî negotibû cima, "tu qerare xwe bide, ye dine hesaye bi ra..."
Çû, serîk li banqe da. Qedir û qîmet dane Ûsiv axa. Mirteza her tişt baş kiribû re. Midir tapiyen gund xwastibû. Reyek ji vvere jî dîtin. Hi nek kaxizen kevn anîbûn ji midirre. Midir tapî nestandibû, le van kaxizan tera wî kiribûn. Di nav vvan kaxizande nişan dida ku Ûsiv axa beşa gund daye û wî gund çandiye, hildaye. Hukumate digot, "alîkari ya gundiyen ku erde vvan hene bikin. Hesaniye û reyen nû nîşanî vvan bidin..."
Midir ji jorere nivisîbû, dora wî vve bihata. Qrediya wî nava panzde rojande derket, hat. Ûsiv axa di dora peşinde bû, li benda traktö re bû. Niha xwe bi xwe her betir qewî didît, dile wî fýreh dibû. Gün den der doran jî bihîstibûn, qedre wî her zede bûbû.
Evv û Zubed axa gelekî nezî hev û dost bûn edî. Dost, di rojen tengasiyede kifş dibûn. Wî jî dostiya xwe nişan dabû. Gazî Eşo kiribû, xwastibû ku Eşo tendurekiyan bitirsîne. Bira bizanibûna ku Ûsiv axa bbcvvaze, vve xirabiyen herî mezin bîne sere vvan. Dikaribû vvan bide kuştine. Şeve bide ber gullan. Her tiştî bike. Her tiştî.
Eşo awqasî li ser vî karî nedisekinî. Careke duda di ser gundre gü lle avetibû. Di serîde gelek je tirsiyan, le paşe tendûrekî jî hîn bûn. Fem kirin ku Eşo dbcvvaze vvan bitirsîne. Kare Eşo bi vî halî direj bû, çû. Wan xwe tirsiyayî nişan didan. Eşo jî di ser gundre gülle diavet, paşe pere vvan gullan ji Zubed axa distand.
Yen ku gund terk kiribûn, edî hatibûn ji bîrkirine. Di ciyen çûyîde jiyaneke nû dest pe kiribûn. Çenden vvan, di vvîlayete, di kare avakirina xaniyande dbcebitîn. Hinekan fekî û heşnayî, bi ereben desta, nav

taxan digerandin û difrotin. "Seven serîn, hirmiyen bi av, zebeşen bi hingiv" digotin û diqîriyan.
Meriven vvan en li gund mayî, dibihîstin ku vvan li bajer dest bi dayin û sitandine kirine. Ji dûrî bajer, di xaniyen piçûk, nizm û mînanî holikande dijiyan. Av û elektrik nîn bû. Zivistane, di şilî û şilopeda, ji ber herî û zirmbce, meriv nikaribû here û be. Tiştek hatibû guhartine, evv jî, niha li vir, ji gund betir feqîr û belengaz bûn. Ji xwe xwere digo-
137
tin ku em hela he di destpekedane. Di bajaran, di ciyen mezinde jiyîn peşiyede vveha bi zehmete.
Ji Oonyaye, Edene kem xeber dihatin. Yen ku çûne Edene, hînî vvir nebûne. Ji birçîbûne, germe, nexweşiye û ji taye gelek kes mirine. Her kesekî qulek dîtibû û sere xwe kiribûne edî.
Deste Ûsiv axa pak bûbû. Evv herdu peçiyen davviye tunebûn niha. Bere jî tiştek nedikirin vvan. Axa, kinge li deste xwe dinherî, hersa vvî zede dibû. Ji gundiyanre dida çera. De û jinen vvan nedihişt. Ev nîşanek bû je re. "Binher em vveha dikin. Em nişana xwe li meriv dbdn. Em meriv vvüo nîvdest dihelin..." Niha hîn bûbû, deste xwe zû zû ba dikir. Çaxa ku meze dikir, dile wî dikire kizînî. Perçek ji bedena wî dipekiya. Paşe hersa wî bi xwe dihat: "Lo Ûsive be aqüo. Devvsa du peçiya, vvekî cane te biçûya, vve betir rind bibiya cima? Mînanî evve ji Qeyseriye, tu qul qulî bikirana. Le vvekî mile te, xwede nekirî çîpa te bihata jekirine... Çîpeke bi dara texistina devvse, vve betir baş bibiya ne? Çîp daro. Ha çîp daro, vve bigotina ji minre. Serda jî axaye çîp dar bigotina devvsa nave min." Ev ku dihatine ber çaven vvî, ruye wî tevî hev di bû, eniya wî radibû û diqurmiçî.
Midire banqe û Mirtezaye sereke partiya nû jere gotibûn, "di van

nezîkayade nebe jî, te di dora duduyande traktöre bistînî." Pir direj bikşîne
jî bi biharere traktör vve bigihîşta deste vvî. We çaxe kare wî yen
çilo xweş bibiyan. We gîha jî pe bikişanda. Herg bikira. Tişten firotine
pe bibira bajer. Qet tişten mîna traktöre heye gelo? Qet derden
awqas kesî te kişandine vvekî traktör hebe? Ser eşa vve tüne, mesref jî keme.
-XXVIPayize
li vvîlayete vvalî, qaymeqamen wî aliye civiyan. Valiyen vvîlayeten
hevvîrdor, qumandaren cendirman, midiren parastine jî hebûn.
Civata vvan vve du roja bikişanda. Ji Enqere midiren bilind û dewsa
vvezîr jî misteşar hatibû. Civat di vvîlayete, di cîkî mezinde dibû. We
parastin, tevgera vvan vvîlayetan û meselen vir qise bikirana. Wezîr vve
bi xwe bihata, le ji nişkeve çûbû devvleteke dine û devvsa wî misteşar hatibû.
Otomobîlen reş, yen vvaliyen vvan vvîlayetan, yen polesan li peş ci
ye civate disekinîn. Polesan, salona civate dabûne bin çavan. Hemû
138
hatin, bin biçengen vvande kaxiz, pirtûken qalind hebûn. Misteşar armanca
civate dûr û direj da nîşandane û davvî vveha gireda.
Armanca me başkirina jiyana gundiyane. Levvra hukumata me
dbcvvaze re û ave bibe gundan, doxtiran bişîne bajaran. Emji bo ve şev
û roj kar dikin. Em dbcvvazin ku gundî ji hukumate hez bikin, di bin
emre cimhûriyetede bin. Levvra çi dbcvvaze, gerek be kirine. Serîde,
parastin mesela herî mezine. Wexta Osmaniyande, salen peşinen cim
hûriyetede, li vanderan parastin nehatiye cî. Hevalen min gerek quvve-
ta qanûnan, hukumate baş nîşan bidin. Gerek meriv him tûjbe,

him jî li ser ve mesele geleklî bisekine. Ji vî alîde gerek em nerm nînbin. Vanderan, ji desten axayen zorbe gelek kişandiye. Ji bîr nekin ku evv devvr derbas bûne edî. Gerek em deste xwe direjî xelqe bikin. Alî kariya vvan kesen vvelatparez bikin. Cot û haceten kevn û edeten berî sed salan gerek edî be terkkirine. Çandina nû, makine tekevine gun dan. Levvra gerek alîkariye bikin, qrediyan bidine yen ku erden vvanî fire û mezin heye. Li dibistanan, yekîtiya millet, yekîtiya çand, yekîtiya hînbûn û xwendine, xwestina me ya peşîne. Hûkûmata me vve saleke dine, ve mesele her peşde bibe, giraniye bide. Firseten nû difikire. Niha ez ji vve, hal û meselen vvîlayetan vve, dîtinen vve yen ku hûn dbc vvazin bejin, dbcvvazim. Bere me nivisîbûn. Gerek vvek raporan bihata bersivkirine. Kerem bikin, vvan bidin min. Ez bigîhînime hukumate. Hukumat gelekî, him jî gelek gelekî li ser vî aliye devvlete disekine. Waliyan bi dor, meselen vvilayeten xwe, dibistan, re, nexweşxane û yen dine digotin. Caran li kaxizen peş xwe dinherîn, hine jimar dbcvvendin.

Berî her tiştî, gund ji hevdu dûrin. Ev alîbi çiya û kevirin. Reçekirin, avbirina gundan, dibistan çekirin zehmete. Ji bo ve, ez dibejim ku van günden piçûk li cîkî nezî hev kom bikin. Wan binine cîkî. Ka re me him zû him jî erzan dibe, vve çaxe. Bi vî halî niha kare parastine jî zehmete. Merî û memur tere nakin.

Yekî dine dûr û direj xeberda û got: Li vî alî vvelet, çi heyfe ku me qanûn, hukumat ter nedaye hezkirine. Evv axayen ku me şandibûn rojava vvelet, me evv şûnve anîn û baxişandin. Tiştekî baş je derneket. Niha bedeng û di bin emre hukumatedene, le meriv nikare bavveriya xwe bi vvan bîne. Kînge fýrsete bibinin, vve dîsa sere xwe bilind bikin. Ez di vvîlayeta xwede, li ser vî karî pir disekinim. Le dbcvvazim ku ev polîtîka me hemûyan û ya hukumatebe jî. Em hemû vvüo bifikirin.

Walîkî dine. sale wî pir zede nîn bû, eniya wî vekirî û namilen wî fýreh bûn:
139.
Ev aliya pir paşde maye. Li hemberî aliyen dine yen Tirkiyaye, evder pir paşdene. Febrîqe hema hema qet tunenin. Re, av, nexweşxane kemin. Elektrik li vvîlayetan û bajarekî dude dine tenede heye.
Ez vî halî, ji aliyen dinen şûnve mayî, ji bo vvelat, ji bo salen peşiya me, baş nabînim. Paşe eme gelek zirare bibinin. Meselen nû vve derkevin peşiya me. Levvra, peşveçûyina vî alî, gerek berî her tiştî li peş çavan be girtine ji bo hukumate.
Hinekan, sere vvan di berde, an dbcvvandin anjî dinivisîn, hinekan jî bi çaven xweve gotinen wî qebûl dikirin. Di civatede fikren cure û cure dihatine gotine.
Qaymeqamekî civvan qala eşîren koçer kir. Di bajare vvîde, karekî giran bû ev mesela eşîren koçer.
Di van vvîlayetan, ya pirîjî di vvîlayeta minde, mesela herî mezin, eşîre koçerin. Koçerin, ji bo beşe nayen jimartine. Zaren xwe nadine xwandine. Dairen eskeriye, qeydkirine nikarin tiştekî bikin. Ji bo.mehkeman
diçin vvîlayeten dine. Evana ji bajar, gundan her dûrin. Li sere çiyan dijîn. Li ber sure sermaye, berf û baranede zaren vvan ji nexweşiyan dimirin. Heyvvanen vvan be alaf û ji nexweşiyan qir dibin, diçin.
Heke ku em vvan li gundan, bajaran cî nekin, em nikarin bejin ku evv jîji xelqe mene. Bavveriya min evve ku peşvebûyin, ji cîbûyina gund û bajaranre derbas dibe. Yeke dine jî, her tim koçerin, pir zirar didine yen dine û hevvîrdora xwe. Her roj, gelek be tevgerî te peşiya me.
Paşe qaymeqame li cem wî rabû. Qala gundiyen be erd kir.
Gundî ezîze mene. Yen mîna meyen ku vvelat îdare dikin, gerek

ku ev zagona me ya herî peşînbe. Le bele vve giştan jî berya min dît ku evvana ne bi hale ezîzan, xwedane vvelatde dijîn. Her tişt te li ser kine, xwarin û jiyana baş. Erd û zevî, dikare zike gundiyan ter bike, jiyana vvan baş bike. Le, vverin le binherin ku erde gundiyan nîne. Jana ve he tanî hestiyen xwe dikişinin. Günden deste, piren vvan, ye axa û beganin. Gundî li cem vvan, bi terbûna zike xwe dixebitin. Xilaskirina ke sen vveha, tene ji vvanre, bi erd dayine dibe. Heke ku em vvan xwayî erd nekin, re, av, nexweşxane û dibistan feyden mezin nade vvan. Yen ku nikarin xwarine bi dest xin, em dibejin ku zare xwe bidine çandi ne. Rûdinin û digrîn. Bi ya min her tişt bi ve noqteve hatiye giredane. Erde devvlete pirin. Piştî çûyina Ermeniyan jî gelek erde baş şûnve maye. Ev gişt niha di desten axandene. Her diçe, traktör dikevin gun dan. Gundî edî nikarin li cem vvan axan jî bisekinin. Ez dibejim ku er de devvlete bere peşîn gerek em bidin gundiyan, bi vvan bidin parvekirine.

Eðer em bikaribin günden axan jî pere... Ev hale nû, hinek me-

140

selen dine tine peşiya me. Axa û gundî li hev dbdn. Hukumat dbcvvaze alîkariya axan bike, alîkariya yen ku xwedî erd bike. Le bele gerek evven be erd jî neyene ji bîrkirine, got û pirsen xwe kuta kir.

Di ve civata ku du roja kişand, qaymeqamekî jî got:

Xwendegehen hundirîn gerek em vekin. Jimar û ciyen vvan peşiyede baş be bijartine. Di nava gundan, xwendegehen hundirîn be çekirine. Em bi vî tehrî, zimane vvan dikarin biqulibînin. Him jî dibistanan li hemû gundan çekirine xilas dibin. Van zaroken ter û civvan, em dikarin kîjan teherî, kîjan fikrî bbcvvazin, bidine. Le dibistanen gundan ne vvehaye. Zarok ji dibistane derdikevin, diçin malen xwe, dîsa zima ne xwe, ye de û bave xwe xeber didin. We çaxe, dibistan evv feyde ku

em dbcvvazin, nadin.
Civatede tişten vvilo, bi cure cure hatine qise kirine. Le bele ne erd didane gundiyan, ne jî eşîren koçer li gundan dihatine bi cî kirine. Re, av û meselen dibistanan nedihatine cî. Her sal dihîştin saleke din.
Ji bo hinek sebeben ideolojik dest bi xwendegehen hundirîn kirin, le evv jîbi dile hukumate neçû serî, hedî hedî hemûyan bend şist kirin.
Ya rastî, hukumate neheqî dikir û evve jî bi xwere, rehetî nehanî.
Oirediyen mezin didane gundiyen devvlemend, haceten çandine dibaxişandine
vvan. Dbcvvastin ku evv peşde herin. Partiyen nû hedî hedî
dest pe dikir. Her diçû, pirsen vvan meriven ku di partiyande bûn, der bas dibûn. Giraniya vvan xwe nîşan dida.
-XXVIIWe
sale zivistan zû hat. Zivistaneke vveha giran qet nedihate bîra
kesî. Gelekî bere, zivstanen wisa bihîstibûn. Kerme û alafen vvan zû xüas bûn. Ji bo ku heyvvanan bigihînine bihare, ka û gîha hindik hin dik didane. Ziken vvan digihîşte hev, parsiyen vvan dihate jimare. Wexta ku dibirine avdane, lebûn ku li erde kevin. Çiqas jî xîret kirin, dîsa gelek heyvvan telef bûn û mirin.
Li gund, yen ku nexweş zede bûn. Yen pirî, pîr, kal û zarok bûn.
Zaren gund hemû bi sorikan ketin. Sorik diqediyan paşe kuxik, agir, alaf û zarok dimirîn. Çiqas dimis didane vvan, sorik nexweşîka hesaye digotin, dîsa jî tifal li pey hev ji ber mirine nedifilitîn. Her roj se çar tirben nû li tev yen kevn dibûn.
Zivistane, xwarin xüas kirin. Xera heyvvanan nîn bûn. Sergin û xwarin kem bû. Niha jî, mirine pesîra zaran bernedida. Dîtin ku gelek za-
141
rok dimirin, xeber dane doxtir. Li bajer û günden din jî sorik hebû.

Doxtir piştî hefteke hat. Piştî sorikan, zarok pişikeşe diketin. Levvra dimirin. Doxtir dbcvvast ku zaran bi derzîbike. Li gund girîn û li hem ber sekinandin dest pe kir. "Qet ji bo sorikan derzîdibe, ke dîtiye eva?" Doxtir yek dudu ji vvan razî kir. Derzî li zaren vvan xist û derman da ye. Yen dine qebûl nedikirin. Ve zivistane, di ve qiyametede, vve ça vva biziviriya bajer? Li ser yen dora xwe diqîriya û diqehirî.
Lo, wexta vveye vveha bikira, cima vve herdu lingen min kirine soleke, ecele kir? Çi feyde awqas zehmete bû? digot.
Çiqasî got jî, dîsa be feyde bû. Mirin dîsa nesekinî. Yen ku doxtir derzîkiribûn, derman dabûne, pak bûn. Dîsa jî kesî îna nedikir ku feyden derziyan bûye.
Nezîkî nîve zivistane, gelek kal, kuxika vvan zede bûn. Bebcem diavetin û bîhna vvan diçikiya. Paşe dimirin. Zivistan çiqasîbe guman bû?
Yen ku aren vvan diqediyan, bi deyn didane hev. Kesî nedbcvvast ku here ber dere Ûsiv axa.
Serma kem bû. Berf û cemed heliya. Jiyan û ronahî hate ruyen ke san. Zivistan diqediya, le gundî jî pere.
Doste Ûsiv axa, Mirtezaye ji partiya nû, li ser kare wî baş disekinî. Kinge diçû vvîlayete, traktora Ûsiv axa dipirsî. Qewl û pirs dabû ku traktoreke herî baş ji Ûsiv axare bistîne. Dixwast ku yeke mînanî trak tora wîxwe be. Wexta ku di sûkere derbas bû, midire banqe cvvji dûrve dît û dergevvane xwe şande pey vvî. Xeber da ku edî dikarin herin vvîlayete, traktöre bigrin. Ve çare, ji her deme zedetir dostî û nezîkayî nîşanî Mirteza da. Mirteza fem dikir ku midir çi dixwaze beje. Mi dir awqas alîkarî kiribû. Wan jî dine û töre dîtine. Di bin vî deynîde nediman. Midir bepar nedihiştin.
Mirteza ji Ûsiv axare xeber şand ku bira nesekine be. Hemû kar bi cîbûn. Piştî çend rojan tev çûne banqe. We dere zerfek dane û yen pe

biçûna "daîra haceten çandine".
Binher bira, em hinekî li heviye man. Derengî man. Le baş bû di davviyede. Xwede ji midir razîbe, pir xîret û alîkarî kir. Traktoreke ji ya min, vve bidine te jî. Tu nizanî Massey Harrîsan. Çekirina kafire îngilîze. Motor ji ser vvanre tüne.
Yek ji ya te, ere. Massey ne vvisane?
Bele. Meriv baş li vvan binhere, hetanî jiyaneke merivekî diçin.
Qet tiştek jî, pe nabe. Eme li vvîlayete, şoferekîdost, ji me bibinin. Ye kî wisa ku ji zimane motoran fem bike.
142
Ez ji tere tiştekî bejim bira? Di vî karîde te gelek zehmet kişand, ez ve qet ji bîr nakim. Qet, qet.
Hela le. Hela le. Ev çi gotine. Eme ji bo_hevdu nekin, îca ji bo ke bikin? Le hindik mabû, min ji bîr bikira. Paşe dîsa kerî me te. Ge lek jî alîkariya wî gihîşte me. Kî erde be tapî qebûl dike û traktöre di de kesî? Gişt jî bi deste midire banqe hate cî. Gerek em jere xelaten bihagiran bistînin. Me pere bidane, dibe ku her betir kerî wî dihat. Na be. Eme jere xelateke baş bistînin. Tu memûran nas dikî. Nedî cari ne, deste vvan nalipite. Le, te pe da xwarine, tişte ku nebe tüne.
Ere vvalle, gotina teye. Xwede zane ku tu jîrî. Hemû deriyan dikarî vekî. Masalla. Him jî hezar carî masalla.
Çûne vvîlayete, bi reberiya Mirteza, şoferek dîtin. Li Edene kar ki ribû, ji motoran jî rind fem dikir. Ne civvan bû. Pore wî gevvr bû bûn. Sî û penc salî hebû. Desten vviyen reş û mezin tiş tişî bûn. Mil û pîlen vviyen bi goşt, di hundire çakete vvîde dihate xuyane. Çaven wî heşîn û xwîngerm bûn. Li Edene kare wî baş bûye, le jin û zaren xwe nikaribûye bibe vvira. Paşe jina wî ku nexweş ketibû, pak nebûbû, evvî jî ka re xwe hiştibû û şûnve hatibû. Niha jîna wî baş bû. Le ditirsiya ku he

re Edene. "Le vvekîjina min dîsa nexweş bibe", digot. Her gotinen Mir teza qebûl dikir. Le bele xwestineke wî xwe jî hebû. Hefte careke an jî deh rojan careke, bikaribûya here cem jin û zaren xwe. Car caran serîk bida mala xwe.
Bele. Bele birazî. Jin û zaren me jî hene. Çavva dibe? Ji bo ku tu kar dikî, nikarî ji vvan dûr kevî, bi sere xwe bihelî. Ûsiv axa vve xwestina te bîne cî.
Ûsiv axa jî tevî xeberdane bû.
Ere. Ere. Kînge te xwest, tu dikarî herî cem vvan. Em jî xweyî malin. Qet ve ji xwere neke derd.
Xeberdan û qerar dan. Heqe meha wî jî birîn, li hev hatin. Paşe tev çûne daîra haceten çandine.
Daîre, di berre reke mezin derbas dibû. Li ser, ji hesinan simbileke genim û çenceke makîna çekirîbûn û çikandibûn. Du qat bû. Cîkî gelek fýreh digirt. Li aliye peşîn ciyen memûran, mala midir û yen çende dine hebûn. Hersek bi hevre ketine hundir. Li dîvvaran, şiklen makînan bi reng û reng, tirpan û gundiyan, makînen ku genim pe dihate çandine hebûn.
Midir li kaxizen deste vvan niherî. Paşe da memûrekî dine. Qasek şûnde kare vvan qediya bû. Midir gazî sermakînist kir. Jere got ku bi-
143
ra Massey Harrîsa ji bo vvan jibartine, nîşanî vvan bide. Her tiştî bi vvan bide tegihîştine. Kaxizen traktöre bide vvan.
Di baxçe davviyede, li ber traktoreke mînanî renge hundire kundira, nezîkî sor, li ser Massey Harrîs nivisî, sekinin. Hersekan bi meraq le dinherîn. Sermakînîst li ser piya qala traktöre dikir.
Xer û oxirbe. Evanan him erzanin, himjîperçen vvan pirin. Rind jî dikişinin. Hetanî heyşt dîska be minet dikişinin.

Wî ku qal dikir, şofere Ûsiv axa sere xwe li dikir, nîşan dida ku evv jî van tiştan zane. Evanan motore nakelînin, germ nakin. Be hîdrolîkin. Meriv pûlbcen vvan bi bendeki qüoz dike û datîne.
Ji kiteba di deste xwede tiştin nîşanî şofer da. Şofer:
Ez li Edene gelek caran li ser traktoren vî cureyî xebitîm. Ya ras tî jî, îro, yen herî baş evin.
Mirteza je fem dikir, le Ûsiv axa qet tiştek tenedigihîşt. Römorka vve se ton bû, le bele nava mehekede vve bihata. Li Edebazare ten çekirine
û ten.
Traktör hildan, ji vve dere çûn. Çiqasî geryan jî tiştekî bi layîqî mi dir nedîtin. Di davviyede qerar dan ku jere xalîçekî bikirin. Xalîçe me zin bû, tede gülen sipî, sor hebûn, li Binyane hatibû dancistine. Paşe zivirîne bajer.
Li ber dere Ûsiv axa, ji bo traktöre ciyek jibartin. Ji bo rûn û bîdonan koxek çe kirin. Her tişt bi cîbû edî. Destur dane şofer, ku here ma la xwe, kare xwenî xebate bike.
Bihar ku hat, yen ku dijîn, giştan qaliken xwe şikandin û dîsa dest bi jiyane kirin. Be hevvîtîji nav rabû.
"Bihar jiyane" gotine peşiyan. Raste. Zivistane pir berf barîbû. Nika diheliyan, çem û aven piçûk gelekî pere hilda bûn, der doren xwe di bin avede hiştibûn. Zevî, çayir ji her salan betir bi av bûn. Dihate xuyane ku îsal vve gelekî fýreqetîbe, zevî û çayir vve zede zede bidin. Hemû bi hevvî bûn. Zivistane ji vvan gelek tişt biribû, niha dbcvvastin ku yen çûyî ji bîr bikin. Xweşî, rindiya bihare awqas dibe edî. Gerek meriv, heyfa zivistana direj dence. Dine tazî û xwe li her alî berdida. Gerek meriv tama bihare dence:
Gelek ji gundiyan, bondirbc, cot û haceten xweyen dine dinherîn,

kemasiyen vvan dianîne cî. Niha edî, derde ka, gîha, savar û arvan nîn bû. Rojen xebate, kar dihatin nû. Heke ku axa dest ji vvan bikşîne. Ya rastî, vvan jî nehiştibû ku axa zeviyan biçîne. Le bele çi ketibû deste vvan? Qet. Qet tiştek jî. Her diçû, hale vvan nedihate kişandine. Ge lek, be hevî û ji cane xwe jî aciz dibûn. Çi bikin? Gelo, lexin herin, ji
144
gund dûrkevin? Eve vveha çavvabe? Bi salan, bi ve jiyana kûçiselaniyede, vve çavva bijîn? Axa edî be derd bû. Di peşiyede kevir, kuçik tunebûn. Dîsa jî her tişt hatibû sere gundiyan.
-XXVIIIZivistana
direj qediya bû. Hemûyan rojen xweş hevî dikirin. We çaxe
axa, traktoreke nû kirîbû û anîbû gund. Tendurekiyan zanibûn ku Ûsiv axa vve traktorekî bistîne. Dizanibûn, le dîsa jî hinek ji vvan "na lo, dibe ku nestîne" digotin di nav xwede. Bûyeren tûj û be însaf niha li ber çaven hemûyan bûn. Le nedbcvvastin ku vvan bûyeran bibinin. Dbcvvastin, vvan neynine bîra xwe. Te digot ku di deste vvande bû. Dbc vvastin ku yen bûyî qet neyen peş çaven vvan. Le tiştek hebû ku nedi hate veşartine. Axa traktora nû anîbû û li ber dere wî bû. Van nezîkiyande vve biçûya, zeviyen gundiyan bajota. Di van rojen xweşde, tirsa bûyeren giran û tûj ji bîra vvan dernediket. Dayin û sitendina axe û gundiyan gelekî kem bû. Ne gundiyan, ne jî axe dest bi hevdu nekiribûn. Niha qudreta Ûsiv axa pir bû. Xwestina gundiyan tene, neajotina zeviyen vvan bûn. Bira axa, evv hale bere qebûl bikira, bes bû. Axe ve xwestina vvan rind zanibû. Le dîsa jî bi sebir û dilfirehî bende ma bû. Ve çare, traktör ya wî bi xwe bû. Levvra kînge bbcvvesta dikaribû biajota. Gundiyan ku her tişt bidîtiyan, edî per û basken vvan vve bişikesta,
nikaribûn li hemberî wî bisekinin.

Niha li bajer, dosten Ûsiv axa ji bere betir bûn. Qedir, qîmete vvî her zede bû. îsal betir be însaf û güne wî bi kesî nedihat. Hemû kes li peş çaven wî piçûk dihatine xuyane. Bavveriya wî bi xwe ji bere pirtir bû. Bere car caran tiştek ji jina xwe dipirsî, niha evv jî nîn bû. Gelekî tûj bû li hemberî xelqe male û giştan betir jî li hemberî jinan. Çibûn jin? "Kesen por direj û be aqü. Gundî jî gerek gundîtiya xwe bizanibe."
Eve vveha çavva bibe?
Merik, cima tu dersek hilda? Meze bike çû traktoreke nû sitand û hanî. Yeke nû, mînanî qîzan. Traktör besî meye ku me ji gund baveje, cane me bistîne. Di navxwede vvilo qise dikirin.
Ana, vve çavva bibiya? Du salen direj bîhna vvan hanîbû ber pozen vvan. Nedbcvvastin ku traktora axa, a nû hatî bibinin. Dibe ku edî nikaribin
zeviyen nûvekirîjî bajon. Ve traktöre vve koka vvan ji gund biqe-
145
tanda. Nîve vvan zeviyen ku nûvekirîne bidine axe, dîsa jî nabe. îsal ji van zeviyan jî tiştekî wisa nehatibû.
Geleken vvan vveha difikirîn, le hinek jî li hember bûn. Çi dibe bira bibe, dbcvvastin li zeviyen xwe bibine xwayî. Oeraren vvan qerar bû. Le hineken vvan vvüo nerm dibûn, vvan karen yen dine jî xirab dikir.
Heke ku eme bimrin, bira tev bimrin. Bijîn jî tev bijîn. Ev çiye em vveha dikşînin?
Diyen me em anîne dine, ji bo ku her tim derd û kulan bikşînin cima?
Pir caran em difikirin, gelo gundî hemû di hale medene?
Em bbcvvazin jî, nexwazin jî xirabî vve derkevin.
Cima eme bi xwe xwe herine mirine? Eme ji nezde bimrin.Yen ku vveha qise dikirin, te digihîştin ku edî davviya vvane. Xwe şûnve

kişandin, vve heta kedere biçûya? We bi van zeviyen kevir û kuçikve şerpeze bibin, paşe evven jî ji dest herin. Ya rastî, ya başî meriv her ti ştî hilde ber çavan û zeviyen xwe nede Ûsiv axa.
"Du sal bû. Hevî û benda bûn. Davviya benda sekine xüas nedibû. Merivji cane xwe aciz dibû edî. Dibe ku reyek be dîtine gotibûn, ben da mabûn, le bele evv jî nebûbû. Le niha? Na xer. Na xer. Zeviyen xwe ji Ûsiv axare nedihiştin. Bi salan mînanî çaven xwe li zeviyan niherîbûn, xwîdana eniyen xwe pere rijandibûn." Zeviyen xwe nedidane ke sî. Awqas serî kilfet, li van zeviyan meze dikirin. Bi biharere, rojen teng jî tev hatibûn. Traktora Ûsiv axa, hinekî jî evv pîj kirin ku qerare xwenî davviye bidin.
Rojan da pey rojan. Van rojan geleken vvan bi tingijî û bi hers bûn. Nû, dîsa di malande diciviyan. Bi hevre difikirîn. Li ser rojen bere, bû yeren kevn xeber didan. Soro, Mîro bi nermî, her tişt û çûyin meze di kirin. Cîranen vvan dilipitîn û reke digeriyan. Wan jî meraq dikir. Di alîkî dinede, herdu hevalen xwenen kevn, Qasim û Seîdve bûyeren nû berbîr dikirin.
Emji vî gundî mîrat herin. Eme heta kînge ji Ûsiv axare xulamiye bikin? Tu naniherî, qet tiştek jî nabe. Saleke dine eme betir birçî û tazî bibin. We zivistan nedît cima? Bîhna me diçikiya.
Wekî em bihîştina, meye hela par evv bişanda vve dine. Niha jî traktör anî, da ber biçenga me. We çaxe nikaribû. De vverin kirina xwe paqiş bikin. Di gundekîde awqas aqildan hebin, davvî ye vvehabe.
Bi vvanre serederî nabe. Me digot ku erd ye meye, em benda vve bûn. Le hukumate bo xatire vî erdî, hanî traktorek jî da Ûsiv axa, kre-
146
dî daye. Lo rabin herin ser şuxulen xwe. Xera vî erdîji mere tüne. Min di vî erdîde mîsto, ere vvalle.

Yen ku diçin bira herin. Diya min jina min kiribe... Bere miriye min derdikeve, paşe linge xwe davejin erde min. Hişe vve li kedereye? Hetanî eze mînanî qehpikan bijîm, bi namus bimrim ji vve çetire, di gotin hineken.
Car caran xeberdanen vvan wisa diçû ku di axiriyede li hev diqîriyan. Kesî edî meraq nedikir ku "gelo axa bibihe". Ji tirsan kesî li dora xwe nedinherî. Ker güûştibû hestîniha. Giştan devji tivdîra berda bûn. Soro, Mîro, be xeberdan bûn. Yekîtî û li hember sekinandin didane peşiya gundiyan. We çavva bibe? Hertim evv tişt digotin.
Oro Soro, me digot ku te hine cî dîtine, hişe te tedigehije. Lo ye kîtî çebû, paşe vve çibe? Bele eme yekbin. Cima em nizanin ku em ne bin yek, eva mirina meye? Bele, paşe vve çi bibe? Cima tu tenagihejî? Eme çi bikin, evve beje? Her tim dibejî yekîtî ha yekîtî.
Soro bersiven yen vveha, neqehirî û nermik dida, her car.
Eme tevayî bifikirin û qerar bidin. Bira, neqehire. Gerek em di le hevdu neşikenin.
Hemû malen gund, te digot ku dikeliyan. Li her cî, "vve çavva bibe, eme çi bikin?" dihate xeberdane.
Axa ev çend rojin ku bi motora xwena nû, ji bere pirtir erd diajot. Xwe jî meraq dikir ku van rojen bi diltengî, gelo vve çavvabin ji vir ha. Wîjî zanibû. Ev edî davviye. Heke ku ve jî derbas bike, her tişte biqediya. Cîranan, evaran, ji bere zedetir serî didane hev, diçûn û dihatin. Ji hevdu dipirsiyan. Diqehiriyan. Dest dihavîtine kîjan kevrî, ji bin derd û kul derdiket. Diqehiriyan, nedibû... Qise dikirin, nedibû. Kal û pîran dua û lava dikirin. Ji bo ku xwede ve belaye ji peş vvan hilde, dîsa lava dikirin. Dîsa jî nedibû. Edî di mizgeftede xeber didan. Ne mizgeft bû, odeke mezin bû, li vve dere nimej dikirin bi tevayî. Nimej dikirin û peyre jîxeber didan. Xeberdanen vvan, car caran hevdu dişikenandjî.

Hedî hedî hînî ve bûn. Dûr û direj li ser gund xeber didan di mizgef tede.
Rojeke, bi hers û tûj, di mizgeftede diaxiftin, pevçûneke bi ziman bû. Pevçûneke giran bû. Bere qasî bîst kesî hebûn. Paşe her zede bûn. Ji vvan yekî civvan:
Birano, vveha dest piyen me giredayî, em li heviya devveta diya xwene, çiye? Zevî tüne, merg tüne. Em bi perçekî erdve zeliqîne, mane. Evv jî bi kevir û kuçik, tera zike du kesan nake. Çi ji deste me te,
147
gerek em bikin. Ji me mestirin, mezinen mene, dibejin em ji hinekenre. Le bele qûna mezinan jî, ji erde ranabe. Civvan, spîçüokî û reng te de nemabû. Zû zû bîhna xwe hildida û dida. Desten wî diricifýyan. Bi hers bû.
Misto, çavekî wî piçûk, spîli ser, pozevviyî direj û xwar, mînanî hertim bedeng bû. Di hale xwede, di hemde xwede bû.
Raste, tu rast dibejî. Davviya ve sekinandine tüne. Heke ku kar berve başbûne biçûya, sekinandin û hevî baş bû. Le bele, her rojen çûyîn, hale me betir xirab dibe. Axa ku traktör anî, her tişt ji bo me qediya.
Ji parre dengek hat:
Hela bisekinin, bisekinin hûn. Kînge ji gund berdane me, vve çaxe hişe vve vve be sere vve. Ji serîde, meriya zanibû ku vve vvehabe. Bi sekinin. Hela hinekî din jî bisekinin. Van "bisekinin, bisekinin"an, ev kar anîn sere me. Tiştekî din nizanim ez. Yen ku digotin "bisekinin", sûc güne ye vvane.
Raste. De vverin, ji nav vî karî derkevin ha. Her tişt tevî hev bûn, vverin ji hev dencin.
Yek li peşiye rûniştibû. Deste wî li ber çenga vvî, ruye xwe dbcurand, be qehir deste xwe direj kir:

Oro lo, me evder kire hemama jina. Piçekî hevdu guhdarî bikin.
Yek bi yek xeberdin. Yen bi sal û kal hene. Ji her serîkî dengek derdikeve.
Ye bûyî bûye. Ye çû nedine dû. Niha, em dikarin çi bikin? Evve
bejin. Hevdu neeşînin, minanî meriyan bejin.
Bele, bele. Raste. Bi qîrîn û gal galan kar naçe serî.Yekî rû ne
pir direj, kal, cbcara xwe danî peşiya xwe:
Xwede qebûl neke. Traktör derket, xweyen gundan niha qet li
hesiren çaven me jî naniherin. Me ji gundan davejin. Be kar û be mal
mane em. De xweyîgund vvisa... Le li cem me. Ev erd yen mene, ge
rek me di serîde kar biqedanda. Hûn çi bejin, ez bi vvereme.
Cîrane vviyî reş û qemer, kin û qut bi dengekî bilind qîriya.
Tu tiştekî nabejî. Nabejî. Niha jî gerek me bere ev kara xilas bi
kira dibejî. Ke li erde dîtiye? Beje, beje, vve çavva bibe niha? Em biheliln
herin an bisekinin, her tiştî bidine ber çaven xwe? Ya rastî, ya di
le xwe beje. Neke mirte mirt.
Ye peşîn dil şikestî û pirçiye xwe kir, got:
Lavvo, tu çito meriyi? Min tu tiştekî xirab negot. Hûn çi dikin ez
jîbi vvereme, min got. Tu di ciye xwede nasekinî. Cima ev der ji te te
pirsin?
Hamoye kal û por gevvr:
148
Hûn çi diqîrin? Hûn herdu jî kerrbin. Hûne li hevdu xin? Ev çi
hale? Mînanî merivan xeber bidin lo. Ez dibejim ku qet xera sekinandine
tüne. Ev du şalin em şerpeze bûn. Me tu kar nekir. Em jî rojeke
peşda herin. Ya baş evve.
Hela le, hela le. Evv jî kale meye. Baqile meye. Yen ku bi aqüe
te diçe û gura te dike, xwede hiş bide vvan.
Lavvo, edeba xwe bizanibe. Tora xwe bizanibe.

Çi edeb û töre? Cima tu nabiheyî ku tu çi dibejî? Tu he zanî ku
li her dere, ji mere nan û goşt çekirine û li heviya mene. Ji mere name
şandine, mora sor jî bi qûne xistine. Li benda mene. Hemû cî vvehane.
Her cî. Gerek em hişe xwe berev kin. Em şest mal bi yekî nikarin
niha. Paşe em ku çûn cîkî nû, li vve dere em bi zarekî jî nikarin.
Ev xeberdan dûr û direj bûn. Hatine çend car kirine. Hevva piçekî
nerm bû paşe. Soro xwast ku vvan di hinek ciyande hişyar bike. Ker
bûn. Çaren bere, kînge ku Soro xeber dida, gundiyen wî dilfire dibûn.
Bavveriya vvan bi wî hebûn. Zede xeber nedida. Derevv nedigot. Evînek,
ronahiyek dikete dile vvan ku evv guhdarî dikirin. Evî çûr, bi teh
rekî din qise dikir. Bi dostî, bi dilgermî.
Me gerek hevdu neşikenanda. Dile me ji hevdu ma. Rojen teng
li peşiya mene, levvra em vveha bi hersin. Du şalin derden me zede bûn.
Heviyen me kem bûn. Feqîriya me her betir bû. Axa li ser erde me rûnişt,
ev jî tere nake, çû traktör hanî. Levvra em diqehirin û bi hersin.
Heyfa vvî, em ji hev derdbdn, ji hev distînin. Dilen hev dişkenin. Van
rojan gerek em her betir bi hevrebin. Hevdu fem bikin. Le bele em ne
vvisane.
Kefa deste wî şil, eniya wî xwî dabû. Pesîra wî vekirîbû. Heke ku
van rojen teng û tarî, yekîtiya vvan nebûya, bela bibana, edî paşe tişte
kî kar nedikir. Levvra wexta ku xeber dida, caran mînanî zara diltenik
û lebû ku bigrî, caran vvek kereke tûj bû.
Di van bûyerande, qet guhe kesî jî tüne. Me nikaribû tiştekî di
ne bikira. Em nezanin, nexwendîne. Yen ku berî me, he jîji me nezantir
bûn. He zanibûne ku dine her tim vve vveha here. Tapiye erde nestandine,
le nebûne xwayî. Her tişt bi tespît û bi qeyd nebûne. Nezanî,

cima hesaye? Hûn wisa zanin? Kîji vve li hemberî van gotinen min derdikeve?
Em nezanin. Loma, niha awqasî dikişinin. Cîranekî, duda got
ku gerek me ev kara bere xilas bikira. Bejin cîranno, meye xilas biki
ra, çi bikira? Çi ji deste me dihat? Em çûne hukumate nebû. Giryan,
zarîn dîsa nebû.
Yek tev xeberdane bû:
149
Le niha? Niha vve çavvabe?
Bise, guhdarî bike bira. Nebe, eme dîsa mînanî biran xeber bi
din û qerar bidin. Pevçûyin, xeyidandin nabe. Em lexin herin. We çaxe
eme bigerin, sitareke ji bo xwe bibinin. Na heke ku me go, eme li
gund bimînin, eme pisten xwe bisiperîne hev, davviye bifikirin. Levvra
dibejim ku eme her tiştî bi hevre bikin. Her roj kare me her diçe bi
zehmet dibe. Gerek em rind bifikirin.
Giştan heq didane vvî. Bi can û dil evv guhdarî dikirin. Soro dîsa di
got:
Gerek em hemû, li ser vî karî rind bisekinin û bifikirin. Eme si
be dîsa li virabin. Eme bi tevayî qerar bidin. Ez ji vve lava dikim. Em
ku hevdu dieşînin, Ûsiv axa duşa dibe. Ev roj, rojen pirsen tehl û dilbirîndarî
nînin.
Gund bedeng bû. Hevvake giran û şîne hebû li gund. Jin û qîz, des
ten vvan di paşila vvande, bi xem û betam diçûn, dihatin. Bi dil nexwastî.
Zarokan nedbcvvastin hersa mezinan bînin. Tiştekî wisa bikin. Xera
şîretan nedibûn. Tûj xeber didan. Dilen hev dişkenandin. Di nav
her tiştîde sûce hinekan didîtin. Jin û mer tevayî, "xwede qebûl neke,
xwede li erde nehele", davviya xeberdanen vvan bûn.

We şeve di hemû malande, herkesi bi tehrekî xeberdan. Gelek tişt hatine gotine. Hinek tehl û tûj, hinek jîbi dibcvveşîbûn bi van peyivan. Van rojen bi hers û xemgînde, vve li ser qedera gund qerar bidana. We şeve Soro ji Mîrore gotibû ku gund terkkirin, çûyîn qet ne başe. Davvî tarî dihate xuyane. Çiqasîji desten vvan te, gerek dest bidana hev û her tişt hildana ber çaven xwe. Gerek gundîjî bi vî avvayî bidana bavver ki rine. Pire vvan jî wisa îna dikirin. Diltengiya vvan, ji metelbûne dihat. Şaş bûbûn ku vve çi bikin. Piçekî kare vvan, qerare vvan teketa re, ev tevlihevbûn û neçarî vve hedî hedî vvinda bibiya. Ji çend doste xwerc jî gotin. Eðer, paşe kare vvan ku bi dile vvan nebû, "yen ku te sere hemû yan, ji mere jî eyd û dîlane" bigotana. Di davviyede dibe ku biçûna hi ne deran. Çend pariyen tisî dikaribûn bi dest xin.

Rojtira dine, piştî nîvro, gelekan karen xwe dabûne ser hev û hati bûn. Xenjî Hesene Hemzo, Esoye Silo, nobedare gund Şukrî, ji du se malan dîsa kes nehatibûn. Çend kes dereng hatin. Yen dine, li ciye teng, xwe civandibûn, rûniştibûn. Mele, piştî nimeje "dibe ku beme, le ez hevvekî nexweşim" gotibû. Le nehatibû. Fate, deste küre xwc girtibû, li pist derî ji xwere ciyek dîtibû. Yekî kal:

Cîranno, li vi ciyî teng, eme bibhecin. Eme çi qerarî bidin, vve rin em bidin. Hûn çi dibejin? Ji duhve vve çi fikirî, çi qerar da?

150

Hemû bi keder û dilteng bûn. Hinek qîriyan, hinek qehirîn. Xeberdan bi dengen bilind dibû, hevdu rind guhdarî nedikirin. Hinekji vvan, gund hiştin û çûyin nebaş didîtin. Digotin ku em li ciyen xwe bimînin û sere axe bikin. Meranre, eybeke girane hiştin û revîn, jin jî wisa na kin. We çaxe çerid hevv keniyan, li Fate niherîn. Evve pirsa xwe danequltand:

Ere, ere. Hema hûn nehelin, nerevin. Jin qet qet narevin.

Hamo dîsa, "ya rastî em zûtire ji vir herin û careke ji xwere bibinin", digot. Hinek li peş derketin. Soro, Mîro li pey hev qise kirin. Fikra ma vine û li hember axe derketine parastin. Xîret û dilgermî dane cîranen xwe. Hamoye kal, qet nedbcvvast van gotinan bibihîse. Dest û milen xwe ba dikir, xeber dida. "Em herin, em herin" digot û tiştekî din nedigot. Li ser xeberdana vvî, Fate xwe negirt û dest pe kir. Gişt kerr bûn. Denge Fate rind dibihîstin. Li aliye Hamoye kal zivirî û jere got:
Tu xwe baqil qebûl dikî, ne Hamo. Yen dînok jî qet van gotinen te nabejin. Her der vvehaye niha. Hemû der. Keder valaye niha? Ev hesinen be oxir, ev traktör hatin nehatin, xelqe hevdu xwar. Zilma axan zede bûn. Kale xurifî, meriv erde xwe bihele û bireve, paşe ji merivanre çi dibejin? Ji min û tere zevî, mergen ter û can tivdîr kirine. Li ben da mene ne? Tu wisa zanî ne? Li hine ciyan, axan erde yen mînanî me, ji deste vvan digire. Li cînan jî, gundiyan ji gundan davejin. Cima te nebihîst?
Günden deste hemû vveha bûne. Hişe xwe bicivîne sere xwe. Çûyin nabe. Nabe. Le, vve gava dine digot ku "mîna jina"... Ka meraniya vve, li ku ma? Ya rastî, gerek hûn bi daren xwe, çoyen xwe bavver bin. Ne bi tiştekî dine. Heke ku ji dile vve naye, dûr û direj xeber nedin. Sibe barkin ji vir herin. Re eve. Xenji ve tiştek nabe.
Ji van gotinan, Hamo pir düşikestîbû. Fedî kir û qehirî. "Kî ve pîreke tine nava meran gelo? Xwede bela daye. Çi te ber deve vve ji me re dibeje". Diricifî ji hersan. Rabû ser çöken xwe. Berve Fate vegeriya, peçiya xwe direjî vve kir:
Fata bi qirej û levvitî. Dela kevvt kevvtoke. Bela xwede. Ji serîde jî, evv pîj kirine te nîn bûn cima, mala me xirab kirin? Gişta guh da evvte ewta te. Wan jî bi wî teherî xeberdan. Ev kar û belan hatin sere me. He jî tu nehatî re. Nasitirî. Te kînge zimane xwe bigrî?

Ewqas cîran me herdûyan jî dibinin. Ez bi qirej û levvitîme? Ere ez? Tu fedî nakîji xwe? Te gelek tişt heq kirine ku ez ji tere bejim. Le bele, ez ji van cîranan şerm dikim. Tu here qurbana vvanbe.
151
Te betir çi bejî? Te tu tişt ji şûnve hişt edî. Erde bav û kale me ye, bele em tegihîştin. Le niha yen Ûsiv axane. Tu tiştekî dine ku em bikin heye?
Di ve navberede hineken:
Ji ku yen vvîne? Erde bave vviye cima? An te peşkeşi wî kir? di gotin û li dij derdiketin.
Niha erde xwe, xwe dajo. Bbcvvaze, dikare berî me bide. Heqe vviye. Bbcvvaze hinekî dide, nexwaze jî qet nade. Qet evlegeke jî nede, em nikarin tiştekî jere bejin.
Fate dîsa tevî gotinan bû.
Na. Na. We bide te. Ji bo xatiren van gotinen te, vve bide te. Qet zirnbce jî nade, tu ve bizanibe.
Çave te li vveye ku em hevdu bikujin Fate. Hinek ji aliye axe be ne kuştine, anjî ji me. Dile teye vve çaxe be cî. Paşe herin, çi di dest û berîka mede heye, bidine cendirman û abiqatan. Di girtîgehande birizin. Xwestina te hemû eve. Em çi bikin? Feqîrin, pe nikarin. Him devvlemende, himjî di hukumatede meriven wî hene. Ya rastî eve. Cî ranno em bi merik nikarin. Cima hûn qebûl nakin? Em çiqasî birçî, tazî û perîşanbin, Ûsiv axa jî ewqas gunekar dibe. Li ve dine çilo xirabiye bi me bike, eme jî li vve dine pesîra wî bigrin. Xwede wî wisa bernade. We je bipirse.
Dengekî xurt bilind bû:
Heke ku tu wî li vve dine bibînî başe. Te vve çaxe je bipirsî.
Ez pesîra wî negirim jî, xwede vve bigire.

Esreke teng bû, evar dihat. Fate dît ku davvî naye, hişe vve çû, peş çaven vve reşe vehatin. Xwast ku derkeve, here male. Dil kir ku pirsen xweyen davviyen jî beje.
Xulî li sere vvebe. Xulî li meraniya vvebe. Ev çi hale vveye? Tu ji karekîre nabin. Tirşe hûn qepeçe kirine. Him jî, ji tirsan, hetanî mejiyen hestiyan hûn düerizin. Fedî bikin. Şerm bikin. Em çend sed ke sin? Axa, bi der dora xweve penc, şeş mal jî nîne. Em ji wî ditirsin. Ge rek hûn cote xwe, gayen xwe qoş bikin, herin seren zeviyen xwe. Em gerek berî vvî, vvan zeviyan bajon. Eme bi çoyen xweve herin peş, bira bene, me li ber seren zeviyen me bikujin. Ya herî baş jî eve. Ji niha xirabtir tiştek nabe edî di dinede. Em bimrin jî qet nebe zaren me vve xilas bibin. Heke ku vve me bikuje, bira be, ser seran û ser çavan. Çi bikin em? Çavva em tene mirine, evv jî dibe bimre.
Hemûyan heq didan Fate. Paşe Soro:
152
Xwişka Fate, gotinen te gişt rastin. Tu dibejî ku tu di dile mede yî. Wüo xeber didî. Hevalno, em lexin herin an jî li gund bimînin û er de xwe bibine xwayî?...
Hemûyan bi hevre:
Necin em. Li ser erde xwe bimînin, gotin.Gelek ji vvan nika dilfýreh bûn. Oeraren xwe dabûn. Hetanî mirine vve li erden xwe bibûna xwayî. Nan bexîret bi deste kesî nediket. Ev sere jiyane bû. Ne tiştekî kembû. Tengasî, hetanî qerar dayine bû. Mînanî ave, hetanî ku j i xwere reke veke. Paşî hedî hedî zelal dibe û dikişe diçe. Hetanî rastî astengeke nû te.
Oerara mayine anjî çûyine dayin... Eva wisa ne hesan bû. Pir, him jî pir pir bi zehmet bû. Vî qerarî, hemû dilfýreh û dilşa kiribû. Cima heta niha ev qerara nedabûn?

Kes derde jin û zarande nîn bû niha û ji jiyane jî qet neditirsiyan.
Ne ji kefe bû, dibe ku ji derd û kulan bû. Rojen ku dihatin wisa giran û zehmet bûn ku kesîjin, zar nedihanîbîra xwe. Niha bi hevre bûn, rehet bûn hemû. Zelal, zelal difikirîn.
Wekî ev kara biçûya serî, qet nebe, zare vvan , zare zare vvan şerpeze nedibûn. Feqîr, belengaz, li ber deriyen xelqe li kar nedigeriyan.
Cima her tişt ne ji bo vve bû? Jiyan, nesle merivan car caran nanelin ku meriv ji bo xwe tene bifikire. Jiyan serîne. Xebata ji bo ku tiştekî li pey xwe bihele, ji zaren xwerejiyaneke serfirazî bi deste xwe xe... Dibcvveşî
di ve xebatede heye. Eva xebateke badilhevva nîne. Di ve xebatede, gelek tişt veşartîne. Bi salan bexew, birçîmayîn, li pey hevîke çûyîn.
Meriv dbcvvaze bibe serî, peşiya jiyane veke. Sere xwe berjer ne ke, eniya xwe bilind bike, di bin mineta kesîde nemîne.
Tendurekiyan ev tene di çîrokande bihîstibûn. Çi zanibûn feqîran?
Hema usa rojen xweş kiribûne bîra xwe. Wan, ev di jiyana qehremane çîrok û serpehatiyande dîtibûn. Gelek rojen bi hevî dîtibûn. Evv qehremanen ji bo hezjekiriya xwe li hemberî gundekî radivvestan û ji ber taneke bejimar kes dişevvitandin, serpehatiyen vvan tev bihîstibûn.
Merxasen vveha Kerr û Kulik bûn, îbo Beg bû, Reşoye Silo bû. Meriv ku berûmet bû, bear bû, vve cima bijî? Kî jiyana vveha pepeha pepez nake, nade bin lingan? Bele gerek heta roja davviye bi hevre, li hem berî axa bisekinîna. Di dile çend kesande dilipitî ku meraniya xwe nîşan bidin. Xwe dbdstine devvsa Kerr, Kulik, îbo Bege Parsinî. Hela ka heta davviye dikaribûn biçûna? Anjî vve xwe bi şûnve bikişandina, hevalen xwe peşda bidehfandina. Cane xweyî serîn xilas bikirana. «Ca-
153
ne xweyî delal xüas bike, dîn nebe», gelo eva dîtina bi gelekanve nîn

bû?
Hemû duşa bûn, ji bo qeraren ku tevayî dan. Hamo jî tûj tûj xeberdan, tinaz û qîrîna cîranen xwe ji bîr kiribû, baxişandibû. Evv û çend malen dine jî eşkere kirin ku cîran çavva dikin, evve jî bi vvanre bin. Xeberdan xüas bûn. Tendûrekî çûne malen xwe. Oeraren xwe da bûn edî. Li malan, hinekan li dar û çoyen xwe digeriyan, hinekan dbc vvastin tiştne dine tivdarek bikin.
- Hate heta ve dera me edî. Em bîhnteng bûn di vederede. Hela ka vve debanca min bîne.
Jinen vvan ji bin ster û sandoqan debancen li pîna peçayî dianîn. Hinekan daren nûyen baş didîtin, vve çaxe yen deste xwe diavetin, diguherandin.
Hemû jîr bûn, «çi dibe, bira lezekî peşde bibe», digotin.
Leze-lez hatin nava gund, li vvir civiyan. Li daren deste hev dinhe rîn. Çaven vvan li ser yen ku dihatin bûn. Paşe daren xwe, her betir dişidandin. Didane çeran.
Zaren piçûk li ser xaniyan, li ber deriyan bûn. Bi meraq meze diki rin, notilanî lîstikeke xweş vve dest pe bike. Çend jinen pîr jî di nav merande
bûn. Dilteng bûn, le dîsa jî cesaret didane meren xwe. Niha he mû yekdil bûn. Hema yekî bigota «ha», her tişt ji deste vvan dihat. Ye kî ku biqîriya, bigota, «de em herin li ser mala Ûsiv axa, lexin bikujin», hemûya vve bi hevre bireviyan. Di dilen hinekande derbas dibû ev ka ran. We mala wî û traktör di nîv saetede bi erdere bikirina yek. Çend kesan dbcvvastin ku bira her tişt zûtire bibe. Le kî vve biqîriya û bigo ta? Li hevviya vve bûn. Tu kesî ev pirsa ku giştan hevî dikir, negot. Yekî kal, di nava gundde, li ser kevirekî, zivirî û cemaetere vveha got:

- Hûn dibinin, em gişt li vederene. Eva nîşan dide ku em erde xwe vvisa hesa nadine kesî. Ye ku ji me te hevî kirine, evv jî eve. Heke ku em bi hevrebin, pişta me naye erde. Le hûn hemû zanin, vve giştan dîtiye, derbas kiriye. We rojen teng û fireh dîtine. Meriv hema ji nişke ve şer nake, li hev naxe. Di davviyede poşman dibe meriv. Pir caran ti şten giran, mezin ji deste meriyan derdikevin. Hûn rind dizanin, hinek dbcvvazin ku yekîbitirsînin, le wî dikujin. Ji bo we, berî lexistine, gerek em hemû reyan biceribînin. Paşe em dikarin bi Ûsiv axare şer bikin. Li hev xistin bi zend û daran dibe, sikir ji xwedere, evv jî bi mere heye. Binherin, di nava nîv saetede em çiqas civiyan? Wisa nîne? Em dika rin dîsa bicivin? Lexistine gerek em di davviyede bînin bîra xwe. Baş bifikirin, rind hildin û daynin vî karî. Heke ku hûn dbcvvazin, niha em
154
herin wî şîkat bikin. Herine vvîlayete. Xwede nekirî, le em yekî biku jin, eme gelek şerpeze bibin. Zar û zeç li ber dîvvaran, di kuçande ti û birçî vve parse bikin.
Ji paşve dengek:
- Dîsa şîkat. Careke din jî şîkat? Qet kesî li ruyen me neniherîn û guh nedane me. Me çi zû ji bîr kir?
- Bisekinin hevalno, bisekinin lo. Bira bipeyive. Bira peyiva xwe xilas bike.
Bi vî tehrî çendek U hember derketin.
Nû, dîsa hineken dine kuştin, anjî be kuştine, li hepsande rizandin, li ber dîvvaran şerpeze bûyîn hate ber çaven gelekan. Levvra kînge ku evv cîranen xwenî kal guhdarî dikirin, desten vvan mînanî bere şiv û dar neşidand û şist dibûn. Hela he kale gotinen xwe xüas nekirî, yekî dine dest pe kiribû jî.
- Qet kes tunebe jî... Heke ku ez bi tene necim, bi sere xwe, li hem

ber nesekinim, ez benamûsim. Le bele rast dibeje. Em wisa bikin ku di davviyede poşman nebin. Poşmaniya dereng be xere. Kerî karekî nabe edî. Tu ku di davviyede poşman bûyî, çi xera vve heye? Levvra he mû reyan biceribînin, rind bifikirin, ya rastî eve. Bi lihevxistine, axa bi mere nikare serederiye bike. Bira davvî başbe, davvî.
- Oro hûn çi zû guhurîn? Çibû? Mînanî ceniyen xam, bîhna vve qediya. Kar hat li ser lexistine û dara, vve dîsa xwe da alîkî. Serme şerm.
Ev kirinen vve eybin. Em be abur bûn, ji ber ruyen hineken mînanî vve. Xwede bela xwe bide yen ku guh didine yen mînanî vve û tene vir. Xeberdan dîsa tev hev bûn. Be rez bûn. Ji hevre, «tirsonek, genefis, heval bi nîv rede hişî» digotin.
Dihate xuyane ku tevayî, yekitî edî xirab dibû. Mînanî sere koran bû. Bende gloka rîs tev hev bûbû. Her diçû, yen ku dbcvvastin ji axere bejin ku «dest ji erde me bikşîne, nezîk nebe» û sere axe bikin, kem dibûn. Şik û şibhe dihate nav vvan.
Soro xwast ku cîranen xwe nerm û ser rast bike.
- Hela bisekinin hevalno. Deqîqeke. Destûre bidin min.
Deng kurt û kem bûn. Çend kes bi tûje tûj li ser hevdû diqîriyan.
Tirsa Soro evv bû ku piştî van xeberdanan cîran li hev xin. Levvra xwest ku, vvan bide îna kirine, bavveriya vvan bide nûkirine.
- Binherin, hûn dibinin. Hela he qet tiştekî mezin nebûye, me dest pe kir ku em hevdu bbcvvin. Tu dibejî ku em hatine vira ji bo ku li hev du xin. Şerm bikin, fedî bikin cîranno. Ji xwe fedî bikin. Eme her tiştî bi hevre bikin. Eme bi hevre xeberdin. Tûj û tehl jî xeberdin le bi hev-
155
dure şer nekin. Hine cîran dibejin ku vverin em baş bifikirin. Yen ku di davviyede bene kirine, ji nahave nekin. Ev ne tiştekî hesaye. Bi zû tire qerardayîn zehmete. Bi van gotinen xweve ne neheqin. Na. Na xer.

Ji erde heta ezmana heqe vvan heye. Me güî kir, le bele qet kesî jîbersiv neda me. Me sere xwe li kîjan kevirî xist, dîsa jî nebû. Dibe ku meh keme kerî me bihata. Le me evv reya neceriband. Gelek pere dbcvvast. Emjî tirsiyan. Dibejin ku wexteke dûr û direj dbcvvaze. Caran qasî em re merivekî dikşînin. Her roj mesrefeke nû te peşiya me. Raste, ev re jî heye. Em dikarin ve jî bifikirin. Le ne bi sere hevdu şikestandî, ne bi çaven hevdu rijandî. Hela em bisekinin bira ape Mihe gotinen xwe xilas bike. Hela ka çi re dide peşiya me? Bihelin bira feqîre feqîr davvi ya pirsen xwe bîne.

Hemû nerm bûn. Bavveriya kesîbi mehkeme tüne bû. Levvra. Bi sa lan çûyin û hatin, zanemer û şahid, pere û nizam çi çi. Dîsa jî bi beza mûristaneke peşde nediçûn. Meriv aciz dibûn, sed carî poşman dibûn ku li vî karî vvalyane. Ne bira ev kara bibiya ne jî ev mehkeme û kûçiksaniyan,

digot meriya di davviyede. Niha hek hatibû di qûna mirîşkede ase bûbû. Le dîsajî kesî mehkeme nedianî bîra xwe. «Mehkeme vve ji mere çi bike» digotin. Kin û kurt peşiya gotinan digirtin.

Li pey Soro, Xale Mihe mînanî ku «binherin, hûn hatin li ser gotina min», li dora xwe niherî û got.

- Li vvîlayete kesen mezin û baş hene. Bi xwe sere xwe kar kirin ne başe. Em vvan pepez dikin bi vî teherî. Nasekî minî tacîr heye, nasen vvî pirin. Abûqaten doste wî hene. Tacîrekî bi namus û başe. Ya rastî em di nav xwede peran bicivînin. Çend heval bira herin, bipirsin, xeber bidin. Bi abûqatan bişevvirin. Bira herine hükümete, mehkeme.

We çaxe eme pişta xwe bidine cîkî qewî.

Hineken ku dbcvvastin li hemberî ve peşneyare derkevin, awqasî li ser nesekinîn. Roj lebû here ava. Ji ber vî qerare nû, hemû çûne ma len xwe ku peran bînin. Di demeke kurtde du sed zer civandin. Jinan

zeren sere xwe, ber kofiyen xwe û ji hustiyen xwe derxistibûn û dabûn. Niha cima dema xemüandin û kincen xweşik li xwe kirine bûn? Rojen mirin û mayine, rojen xîrete bûn. Hemûyan çi ji desten vvan ten, gişt anîn û dan. Bi vî teherî giştan xîreteke bi namus anîbûne cî û şa dibûn. Soro û Mihe, nave yen ku pere didan, nişan dikirin. Qet ji hinek ma lan bavverî nedikirin, ku pere vve bene. Jinen vvan zeren sere xwenî, ji mala bave xvve hatî, dianîn. Çaven meriyan tijî hesir dibûn. Hinekan dizanibûnku paşe dîsa pere vve bene xwastine, levvra hindik hindik di dan. Ji bo careke din bira çend qurişen vvan bimîne.

156

Nişkeva Rewşa gund ne baş bûbû. Gundî hemû civiyabûn ku li zevi yen xwe bibîne xwayî. Ûsiv axa her tişt dît û bihîst. Nava awqas gundiyande

xwe bekes û tene didît. Be taqet bû. Le vvekî evven tî û birci j i nişkeve rikef bikin û li wîxin? We çi bikira? Evv, küre vvî, çend xwarzî û xulamen wî bûn. Xulam küre xelqene. Berî hemûyan evve bihata na û pesîra wî bigirtana. Van rojan bi dilbaziyen vvan nayen derbaskirin. Bi pele pel li dora xwe dinheriyan. Giran giran û hedî hedî dbcebitîn. Çavva merî bi vvan bavverî dike?

Gazî küre xwe kir. Teme daye ku bira tivdareken xwe bikin, ji bo xulaman jî debance, ker, dar, hine tişt bira bin destbin.

Gund dikeliya. Hinekan gund tev didan. Bûbû helîna xirabiye. Di van demande, yekî ku meriv qet tiştekî je bavver nake, nişkeve dibe mencasekî û kes nikare li peşiye bisekine. Hema careke, yen vveha bi ra xwe nedine ser re. Peş çaven xwe nabînin. Kes vvan j i riya vvan ni kare vegerîne. Wisa be vvijdan dibin. Le dbcin û her tiştî dikin. Tu di bejî ku bîst şalin li benda ve rojene; Mala axe di tirs, şik û şaş bûnede bû. Hişe wî tev li hev bû. Malek, ye çavva bi gundekîre serederî bikirina?

Jin û zaren gund, çavva bi çaven dijminan li vvan dinheriyan, hate bîra Ûsiv axa. Bi kesî nişan nedayî, li kuçan, ber dîvvaran, di bin çavande meze dikirin ku binherin çi dibe û çi dikin? We niha bene. Aha li ser hatinene. Tirpe tirpa dile vvan bû. Şev meriven vvan en bi îtbar, vve xeberen rast bianîna. Ke çi digot û çi dbcvvastin?

Evv tişten ku axa je ditirsiya, qet yek jî nebûn. Gundiyan Soro, Xale Mihe û du kesen din dişandine vvîlayete. Yen evv tacire ku Xale Mi he nas dike, bidîtana. Derden xwe jere bigotana û li ser reberbûna vvî bi abûqatekîre xeber bidana.

Ûsiv axa rojtira dine, piştî şeveke bexew û xewnen xirab, çû bajer. Çû cem doste xwe, qumandare cendirman. Tirsa xwe û gundî çi dbc vvazin binîne sere vvî, ji qumandarre got. Hine pere jî da qumandar. Rabûn tev çûne cem qeymaqam. Yekî digot, wî dihîşt û ye dine dest pe dikir. Ji qaymeqamre yek û yek gotin. Gundî çi dbcvvazin bikin û ar ýnanca vvan çiye? Rind bavveriya wî anîn ku gundiyan dbcvvast tiştekî giran, xirabîke mezin bikin. Gerek evv rind bihatana pefçiqandihe. Meriv çiqasî bi sebir û nermayî dbcvvaze ku bi vvanre re here, le dîsa evv nasitirin, pir peşde diçin. Çend kes li gund hebûn ku vvan aqübendî dikir. Fesadî dbcistine nav gund, vvan gundî ji re derdbdst. Van nedihîştin ku cîran gund bihelin herin. Digotin ku «eðer em yekbin, eme berî axe bidin, hestiyen wî hûr hûrî bikin.» Hükümet û qanûn qet ta laşa vvande nîn bûn. Oelemek di deste qaymeqamde bû, him pe di-

157

leyst, him jî xwere pe hinek sikil çe dikir. Civata li vvîlayete hate bîra vvî. Li vvedere dûr û direj xeberdabûn ku erde bidine gundiyen be erd. Piştî civate misteşar çi gotibû, mînanî niha ber guhe vvîde bûn. Te di got ku, di serîde nû dibihîse. «Em hemû reber, meselen nû dernek ti, revvşeke baş bidine peşiya xwe û xelqe. Qanûn gerek li ser her tiştîbin.

Emren qanûnan gerek beşik, beguman bene cî. Hukumate derd
û meselen nû nedbcvvast. Le gerek destur nedin ku gundî karen beqanûnî bikin.»
-XXIXHer
çar hatin dikana tacir Xelef, nase Xale Mihe. Bere awqas devvlemend
nîn bû. Dihate gundan bene, pez, hirî û genim dikirî. Tacire
her tiştî bû. Waxta rûn û pener, bi meriven xweve dihat, bi hespan, ereban
dikişand dibire bajer. Car caran peren vvan peşîn dida û gundî dibir
li bajer male wî dida vvî. Careke duda hatibû günde vvan jî. Paşe
kînge Mihe tiştin dibir li bajer bifroşe, evv didît. Qet xeberdanen be
kar nedikir. Bi yekîre qise dikir û ji yekî dinre karek digot. Ji zimane
gundiyan rind fem dikir. Rind zanibû ku çaven vvan bi çi bahayiye, vve
ji dikana wî çi bistînin. Mînanî kefa destî xwe zanibû gişt. Gundîji cem
vvî, tiştek nekirî an jî tiştek nefirotî dernediketin. Li vanderan, ji se, çar
tacîren herî mezin yek jî evv bû. Kesî nizanibû çiqas peren wî hene. Be
hesab bû male vvî. Hemû kes, jere deyndar bûn. Mîna bere edî ne li
ser xwe bû, kal dibû.
Dikana vvî, nava sûkede, ji jorve çûyine, li deste raste bû. Gelekî fireh
û bilind bû. Bi tiştan tijî bû. Kine, pirtî, çi digerî dikarî bibînî li vi
ra. Hemû tişten dine jî. Li aliye peşîn, ciye tiştan dide û peran distîne.
Ji bo evv meriven, ku vve tiştan bistînin, bo rûniştandine cîkî direj bi
textan çekiribûn. Yen ku cînedidîtin, li ser piyan diman. Di davviya dikanede
derîkî din hebû. Evv derî vedibû li aliye herdu enbaren mezin.
Deriyen van embaran li aliye dine, riya pist dikane dinherî. Li vve de
re hirî, pener, rûne gundiyan dihate pîvandine. Nivîsdar û berdestiyen
vvan diçûn, dihatine hundir. Tişt dikişandine embaran. Çûyin, hatin

hetanî nîvro dikişand. Paşe dihatine hundir û hesabe vvan dikirin. Ke sî mecal nedidît ku tacîr Xelefre dûr û direj xeber bide. Yek dihat û yekî din diçû. Nivîsdar derheqen tişten nû pîvandî dipeyiviya. Küre vvî, heqe tiştan dinivîse, bersiven bave xwe digîhîne vvî.

158

Evv ku hatin dikane, hundir tijî meriv bûn. Xelef kaxizek li peş, gundîkî tişt kirîbû, wî jî bihayen vvan dicivand. Xelef yen nû hatî bi sere xwe silav kir. Bi reqemen kevn dinivisî û li ser hev kom dikir. Li peş, nezîkî wî du mer ûjineke bi salzede hebûn. Dibe ku diya vvan an jîxwîşka vvan mezin bû. Qumaş, leçek, kincen hundir sitandin. Jinike çend metro patisqe xwast. Tivdareke dîlaneke, davveteke dikirin, çibû? Evvqas tişt ji malekere zede bûn. Dibe ku vvisabe. Tişten xwe peçandin û derketin. Yen nû diketine dore. Li ser namila wî heqîwek hebû. Kem tişt sitand. Ji kine û hale wî kifş dibû ku yekî feqîr bû. Bi tengasî hinek tişt xwast.

Xelef bi metro dipîviya.

- Çend mehan şûnve bencan bi ter û can dbcvvazim ha, got.

Gundî, çaven vvî, xenji pirtiye ku distîne, tu tişt nedidît.

- Çi dibejî Xelef axa? Evv ye tene. Cima eze xera bave xwe bidime te? Le even ku ez dibim cine?

Xelef him dipîviya him jî duçar dikir ku ji bîr neke. Yek xüas kir û got:

- Çi zanim? Paşe li pey te neme gund! Li pey te nepirsim paşe!

Gundî tişten xwe berev kir. Xelef defter tevda û li cîkî deyne wî nivisî. Gundî dîsa zivirî û:

- Rema xwede li bave tebe Xelef axa. Tu dikarî tirpaneke şakirof jî bidî min? got.

Tirpanen şakirof, yen herî qencin. Ji birrîne û damîşbûne, ser vvan

re tirpan tunenin. Ji yen din zedetir tene kar kirine. Him jî çend sal. Hertim nedihatine dîtine. Bi dest nediketin. Xelef axa giran girt, le bi lavakirina ye dine damîş nebû. Ji jer, ji qutîka texte, yeke çar numre dendst û da gundî. Evv jî li deftere nivisî. We çaxe dîsa hinek hatin û hinek çûn.
Tendurekiyan ciyen vala dîtin, rûniştin. Xwastin ku tene bimînin û derde xwe jere bi xweşik bejin. Çend kesan dîsa tişt kirîn. Xelef ji van çar kesan, tene Mihe nas dikir. Evv jî ne pir. VVekî mişteriyen xwenen dine. Yen ku vveha peşde nedihatin, şûnve disekinîn, Xelef evv rind nasdikirin. An qîza xwe didine mer, an jî küre xwe dizevvicînin û bi deyn tiştan dbcvvazin. Anjîji bo karekî, peran deyn dikin. Levvra ji nihava mî, bene, rûn, genimen xwe difrotin. Pere xwe bi peşve distandin û diçûn. Yen vveha betir kerî Xelef dihatin. Bi erzanbiha distand û giranbiha
difrote vvan. Dor hate tendurekiyan. Nû bi serîde hevdu silav kirin. Bi sare sar hal û xatire hev pirsîn.
Mihe:
159
- Xelef axa, derdekî me bi gundîtî heye. Em hatin bi te bişevvirin. Ûsiv axa dbcvvaze ku erde me ji deste me bigre. Gelo tu dikarî alîkari ya me bikî? Sikir ji xwedere, tu mezinî. Hemû kes te nas dikin. Li hü kümete, li mehkeman gelek dosten te hene. Reke nîşanî me bide. Be re xwede, paşe me tu gotî, em hatin.
Hineken nû hatin. Herkesi tiştek dipirsiya. Xeberdana vvan dihate birîne. Xelef tegihîşt ku ev tiştekî tevîheve. Ya başî evv bû ku nîvro, wexta navroje, çend deqîqen xwe bide vî karî û evv guhdarî bikirana. «Dema ku ez mezin hesab kirine, hatine cem min, gerek ez vvan guh darî bikim. We lezeke bikşîne. Dibe ku tiştna jî bistînin, bi deyn peran

bigrin. Ev başin û gura meriya dikin», got bi xwe xwe.
- Hûn dibinin ku gelek kare me heye. Kare vve, heke hûn dbcvvazin, çend saeten şûnde, bi karberdana nîvrode em xeberdin. Dereng ne minin. Hûn dibinin ku çiqas ten û diçin.
Tendûrekî şa bûn li ser ve peşneyare. Rast digot Xelef, di nav avvqas kesande, her yek tiştekî dibeje, meriya nikaribû derde xwe ji hevdure beje. Ne tu dikarî bejî, ne jî evv dikare guhdarî bike.
Mihe:
- Way xwede ji te razîbe. Tu çavva baş dibînî, bira vvisabe. Li ser se re me. Em dereng namînin. Tu me hazir bbcvvaze.
Xwe bi lez avetine der, çend kesen din diketine dikane.
- Xale Mihe, ev çito tacire? Way bavo, ev çiqas devvlemende? Çend meriven wî hene, hey lolo. Hewqas male min hebe, ne wisane? Kincen qenc, xaniyen rind, xwarinen xweş, -paşe kenya- jinen bedevv ye merivan dibin.
Ye peşiye:
- Le tu hale wî dibînî. Qet ne dibcvveşe. Ji yekî distîne dide yekî di ne. Na, gelo çi hat, gelo çi çû? Tu dizanî qet di meriyande hiş dimîne? Li tevî qelebalixa sûke bûn. Diçûn.
Soro:
- Min ev bihîstibû, le nedîtibû heta niha. Dibe ku bere dihate aliye me jî, naye bîra min. yekîjîre, dijvvare. We ferq kir qet? Çiqasîbilýa jî beje, kes li hember dernakeve. Ji bo ku bi deynbe, vvehaye. Male xelqe jî, evv çavva dbcvvaze bi wî bihayî dikire. Yen vvilo dijvvar dibin. Ti şten ji desten vvan neyen, tunin. Hela ka ji mere vve çi beje?
Xale Mihe bersiva wî da.
- Dayin û sitandine ev. Kara meriya tede tunebe, kî qurişekî xwe di de? Peren xwe nade cîkî dine. Te, male xwe dide te. Piste çend me

han tu heqe wî didî. We kar bike. Paşe, tu bi zore nafroşe kesî. Yen
160
ku distînin, bi dile xwe distînin, birake Soro. Kare van jî eve. Hişe me vana hilnade.
Soro:- Raste Xale Mihe. Pere me tunebe, qûna me jîtazîbe, eme ji xwere derpîkî, şalekî bikirin. We çaxe hinekî kem, an jî hinekî zede, kes le nanihere. Devveta küre xwe an jî qîza xwe bikî. Gaye te miriye, te gakî bikirî. Küre te nexweşe, jere pere dbcvvaze. Te dîsa vve çaxe beyî, tiştekî teyî fýrotine hebe, te erzan bidî. Evv ku peran bide, vve bihaye vvan tiştan jî bi qîma dile xwe beje. Ez dibejim, bi herdu seriyande jî kara vviye. Çi me re? Gotina teye, gundiyen feqîr bi dile xwe distî nin. Kemasiya vvan heye, çi bikin? Çi mere lo? Pirsek bû min got.
Li peş yekî kibabfiroş derbas dibûn. Deve vvîde cbcare, kirasekî bi qirej le bû. Çavekî wî ji ber tave venedibû, ruye wî ji hefteke zedetir direj, pencî salî dihate xuyane û diqîriya:
- Kerem bikin. Bege min keremkin.
Yekî zik berdayî, pesîra kirase wî bi rûn û qirej, wisa nîşan dida ku qasî kibaben ku difroşe, awqas jî dbcvvar.
- Keremkin, ha kerem kin. Ha vverin, ha vverin.
Derî vekirîbû, bîhna goşte qelandî dihat. Li ruyen hevdu meze ki rin. Zike vvan birçî bûbû. Hînî qelebalbce nebûbûn û hişe vvan diçû. Nezîkî nîvro, edî şist bûbûn.
Bajarî, kincen xweş le bûn û zû zû diçûn. Renge kincen vvan çiqasî delal bûn. Jinen bajariyan, te digot qet tav nedîtine, bi xeberdan di çûn, li cem hinekan zaren vvan hebûn. Ser û pore vvan vekirî û leven vvan boyax kirîbûn. Mil û zenden vvan negirtî bûn. Tendurekiyan him diçûn û him jî li dora xwe dinherîn. Di bin çavande li xelqe dinherîn ku gelo kes li vvan meze dike an na? Qet telaşa kesî nîn bû. Kesî evv

nedidîtin. Jinen bedevv ku didîtin, bi hevre henek dikirin.
- Oro ev bajarî jî dijîn ha. Jinen vvan çi xweşikin?
Hingî kibabfiroş diqîriya, «kerem kin ha, kerem kin» digot, damîş nebûn, evv jî ketine hundir. Li ser masan mişembe hebûn. Tarîlk, çetel û kevçî danîne ber vvan. Feqîran kînge bi çetelan xwarin xwaribûn? Soro li Edene mabû, wî zanibû. Le yen dine? Bedeng rûniştin, nedbc vvastin ku tiştekî şaşî bikin. Zarekî piçûk, çilmisokî, vvestiyayî, bi pînekî ser mase paqiş kir û dest pe kir; jimart.
- Goşte mînanî sere çivikan, kibaba Edene, kibaba bi badilcan, kibaba di tasede, kiften petî...
Hemû di derbekede li ser hev rez kirin.
- Keremkin bege min. Çi dbcvvazin?
161
Qet tu tişt fem nekiribûn. Gişt jî kibab bûn. Ev yeka fem kirin. So ro evv ji şerm kirine xüas kirin.
- Careke din beje, le hedî hedî.
- Keremkin bege min. Goşte vvek sere çivike. Kiften petî. Kibaba Edene. Kibaba bi badilcan. Kibaba di tasede.
Soro qerar dabû, ku kibaba Edene bbcvvaze.
- Bira ya min, kibaba Edenebe.
Lavvik li aliye yen din zivirî.
- Le hûn? Edene xweşe. Ji vvere jî bînim?
Hemûyan qebûl kirin, sere xwe hejandin. Garson dîsa jî li ser piya bû.
- Bira çend hevvbin, bege min? Yek an du hevv? Bira çilo be?
- Bira ye me gişta jî yek û nîv be, got Soro.
Garson çaryek nan da ber vvan û çû. Paşe qedeh û di şûşekede av anî.

- Niha, hema zûtire, kibaben vve tene, got.
Tendurekiyan hîn nebûbûn, awqasî zede li heviya xwarine biseki nin. Bere li nane mînanî pemûû qedîfe niherîn. Paşe bi desten xwe teselî kirin. Bi tirs perçekî piçûk je kirin, avetine deve xwe. Çend deqîqe şûnde li peş vvan nan nemabû. Kibaben Edene anîbûn. Kibabeke direj û nive wî jî li cem bû. Wekî fedî nekirana, li cîkî dine buya, vve di carekede hemû biavetiýia deve xwe. Qet meriv bi vî ter dibe? Soro ji vvanre got, bi nan gerek ziken xwe ter bikin. Evvî çilo kir, yen din jî vvi sa kirin. Di bîhnekede xwarin, xüas kirin. Bi serde av vexwarin. Birçîbûna vvan hinekî kem bû. Le bele ter nebûbûn. Heqe kibaban dan, derdiketin, garson daren nav diranan anî. Yen dine, di bin çavande, van daren ziravok dinherîn. Soro çend hevv hildan û kirine berîka xwe. Li derve ji hevdure:
- Tu cima nabejî ku li bajer her roj hemû birçî diðerin. Xwede ne giravî, me yek na, yek û nîv kibab xwar. Bi nave xwede, bîst hevven vvilobbcvvim,
dîsa jî ter nabim. Hezar carî sikir bikin, ji bo hale meyîgund.
- Te dît, çiqas jî pere diçe? Way. Way.
Hedî hedî berjor, berve aliye dikana Xelef çûn. Nedbcvvastin ku je dûr bikevin. Oedereke geriyan. Dikanan yek yek deriyen xwe digirtin. We çaxe tedigîhiştin ku wext hatiye. Çûne cem Xelef.
- Zû bikin, zû bikin. Bi nîvro hemû der tene girtine, digot Xelef.
Çend gundî, di hemeza vvande tişten ku kirîbûn, ji dikane derdike tin. Xelef ji ye cem xwere:
- Xepeng û derî bigre küre min, got.
162
Xepeng nîvcî berjer kiribûn. Hundirde niha Xelef û tendûrekî te ne hebûn.

- Hela kare xwe bejin, ji minre. Hûn meze dikin ku, kar zefin û giranin. Hela he eze herim male jî.
Ji Mihe pirsî. Xale Mihe her tişt ji serîde xwast beje, le binek ji bîr kirin û hinek jî bi xwe jere negot.
Abûqat Fihat hate bîra Xelef. Fihat beg doste vviyî baş bû. Ji dûrvebe jî, bi qîzeke merive vvîre zevvicîbû.
- Di nava awqas karîdebe jî, eze bi vvere beme, bi abûqatre xeberdim. Çi ji deste min be, ji bo vve, şûnve nahelim.
Bihîst ku li cem vvan du sed zeren zer hene, betir nerm bû. Dostî nîşanî vvan da.
- Eze ji male bizivirim, heviya min bisekinin, em tev herin cem abûqat Fihat beg. Li ve dere abûqate herî mezin, bi nav û deng, evve.
Ji cîkîre telefon kir.
- Yildiz xanim. Hûn çevvanin?
- Bele ezim. Xelef. Fihat beg li male gelo? Deqîqeke. Sipas dikim.
- Elo. Fihat beg. Merheba bege min. Çavvanî, başî? Na. Na. Heke ku tu nîvro şunda, li ciye xwebî, çend dosten min hene, ji bo karekî vvan, min xwast serîkî bidime te. Bele. Bele. Sipas dikim.
Fihat beg, vve nîvro şûnde li heviya vvan biya.
Tacîr Xelefji bo tiştekî bi xer dihate cem vvî. Fihat beg wisa texmîn dikir. Levvra zûtire çû dayra xwe. Bere jî Xelef beg çend kar şandibûn cem vvî. Hemû jî karen baş bûn. Karen ku peren vvan zede bûn. Heta nî li pey çend devvan diçî û teyî, devveke bi giranbiha bigre, her baş di be. Xelef beg di alîkîde jî merive wî dihat. Gere wisa bikira. Le bele, Fihat beg jî ji bo kare wî hertim sere xwe eşandibû û jere hürmet di kir. Dosten herduyan jî zanibûn ku Xelef ji Fihat û Fihat ji Xelef hez dike. Qet hevdu neeşandibûn. Car caran di vvan seven zivistane direjde diçûn malen hevdu, dihatin.

Kare Fihat bege, bi abûqatî baş çûbû. Paşe dest bi tişten dine kir. Kederede, çi kerî wî te, baş dizanibû. Di nav abûqatande gelek caran qala wî dikirin. Doste vvalîbû. Hakim û savvciyanre hevaltiya wî hebû. Mezinen vvîlayete, peşde hatiyen van aliyan, yen ku bi polîtîkaye kar dikin, giştan Fihat beg nezî xwe didîtin. Niha li bajaren der doran jî bejimar dost û dibcvvestiyen wî hebûn. Zû zû re diçû. Jiyan hez dikir. Piçekî qelew bû. Eniya wî be por bû bere, le niha sere wî hema hema tût rût bûbû. Renge wî hevvekî vekirî, çaven wî heşîn bûn, ne heşîntîke vvisa tarî. Ji vvîlayeteke dine hatibû vir. Li vira cî girtîbû. Çi bigirta
163
dibire serî. Te digot bersiven vvî, di berîka vvîdane. Abûqatekî bi nav û deng bû. Kare wî her ku zede bû, dora wî fýreh bû, edî mînanî bere li pey devven xwe nediket. Wexta devve digirt, ji herdu aliyen ji dosten vvî, dbcvvastin ku alîkariya vvan bike.
Li ser riya ku diçe hükümete, oteleke mezin û di bin otelede jî, çend dikan didane çekirine. Her otel çedibû û bilind dibû, peren deste vvî gişt hedî hedî diheliyan. Ev merive ku awqsî bi aqile, çito nizanibû, ji bo vî karî gelek pere vve biçûyan? Zanibû. Le bele gelekan bi xeberdane alîkarî kiribûn. «Xwede alîkariya yen ku xanî çedikin düce» gotibûn jere. Çend dosten wî yen devvlemend, alîkarî kiribûn. Hinekan jî bi deyn tişten ku bi kerî wî ten, dabûne. Le, ya rastî ev kare ku xwe dabû ber, giran û fireh bû. Li alîkî jî, xwastibû ku di penc, şeş mehande vî tiştî mezin xüas bike. Ji bo devvan diçû bajaren der doran, li ve gere zûtire direviya ser çekirina otele. Ji vvir dibeziya mehkeme, ji mehkeme diçû ji bo tişten ku nedihatine dîtine. Di van rojen davviye de vvestiyayî û be taqet bû. Heke devveke bi giranbiha, îro, sibe bi dest biketa, vve pir baş bibiya. Telefona Xelef bege evv hevîdar kiribû. Xelef beg û tendûrekî ku ketine hundir, Fihat bege evv li ser piyan

kerem kirin. Xelef beg, li cem xvve da rûniştandihe. Ji yen dinere jî cî nişan da. Çend gundî, piştî mehkeme, vve biçûna günde xwe, Fihat evv bi re kirin.
Xelef û Fihat qehwe, yen dine jî çay vedbcvvarin. Hale hevdu pirsiyan. Xelef bi zimanekî nermik jere got, ev nasen wî û ji dikana wî dan û sitandina xwe dikirin. Ji bo erde, xweyî derd bûn. Xwast ye mayî jî evv bi xwe bejin.
Gelo kî ji vvan vve beje? Levvra li ruyen hevdu niherîn. Di davviyede Soro dest bi qalkirine kir. Abûqat Fihat beg gelek baş guh didaye. Xelef beg, li hinek pirtûken bi reng dinherî, tev didan. Car cara jî sere xwe bilind dikir, li ruyen vvan meze dikir, nişan dida ku evv jî guh di de.
Soro got ku tapiyen vvan tüne bûn. Qeyden tespîte jî nîn bûn. Le bele li cem Ûsiv axa bi xwe jî tüne bûn. Meqbûze, kaxizen beşdayine tene hebûn li ba axe. Paşe qala vvan kaxizen ku gundiyan mor kiribûn kir. We çaxe Xelef kete nav xeberdana vvan.
- Dibcvvastina min ji te evve ku tu erde vvan, be kuştin û be şer bidî vvan. Li ber peran nekeve. Xwede nişan nede. Heke yekî bikujin, anjî bene kuştine, xirabiya giran evve.
Fihat bege eniya xwe bi destmaleke sipî zuha kir û got:
164
- Na lo. Na lo. Devva vvan awqasî jî ne begumane. Aliye dine jî mî nanî vvane. Tu ferq tüne di nava vvande. Di dest vvande, pirtûken ku bi kar ben tunenin, le bele di dest yen dinede jî nînin. Bes ku çend me riven kal bibînin. Ji vvan günden der doran. Wan deran rind nas bikin, cî bi cî nîşanî hakim bidin. Zaneyen bi sal vve di ve devvede re nîşanî hakim bidin. Bi destura xwede eme ji bin vî karî derkevin. Be şer û be kuştin. We herin li ber zeviyen xwebin. Çend rojan bere min devveke

mînanî ve heq kir. Le tiştek tene heye, dibe ku hinekî direj bikşîne. Devven erde, zevî û mergan vvilone. Na keşfa vvan, zaneyen vve dere, na nizanim çi, bi salan direj dibin. Yeke din, hûn dizanin ku devven vveha direj, hinekî jîbihane. Gelek pere dbcvvaze.
Bi qelema deste xweve him dileyst û him jî dbcvvast ji ruyen vvan fem bike, hela ka çi difikirîn. Evv çi dibejin? Di davviyede vve tiştekî ku be qebûlkirine, bigota.
Xale Mihe:
- Xwede te bihele. Xwede ji te razîbe. Em tedigîhejin, bi deste te kare me, vve here serî. Le bele tiştek heye. Niha, hetanî davviya meh keme, kî vve van zeviyan bajo? Eme zeviyan biçînin an Ûsiv axa? Tiştekî qet ne baş dipirsiyan. Devve vve dûr û direj bikişanda. He ke axa, vve zeviyan biajota, vve çaxe çi dikete deste vvan? «Nemire kera min nemire, bihar vve be». Hevalen wî jî bi meraq li çaven Fihat û Xelef began niherîn.
Soro:
- Ya rastî, eðer dîsa axa vve zeviyen me bajo, hela he devve neqedyayî eme bimrin herin. Me jî bihîst, hine devve bi direjiya jiyaneke di kişinin. Evv hakim diçe, yekî din te. Ye nûhatî, hinekî hîn dibe bûyere, evv jî diçe paşe. Yek vve qerar bide, «de vvede here lo, çi ji minre, bira yekî dine qerar bide» dibeje, diçe.
Fihat bege dît ku evî porsor, rû zer, ji van tiştan fem dike, ne awqasî nezane.
- Raste. Dile meriyan hünade. Li vvelate me mehkemen zûtire naşixulin. Gelek kes je zirare dibinin, got Fihat bege.
Xeberdana xwe ajot, xwast ku Xelef jî heq bide vvî.
- Heke nebû, di peşiyede eme devveke din jî vekin. Devva peşîgirtina zirare. Wekî bikaribim hakim razî bikim, wisa zede pere nexwastî

jî, meriv dikare bîne cî. Ji bo qîmete zeviyan, genim û cehen ji vvan ze viyan te hildane, meriv hine pere radizîne li cem hükümete.
- Bele. Bele. Peren ku peşde be razandine dbcvvaze, got Xelef bege û li saçta xwe dinherî.
165
- îro jî pir kare min hebû. Ez gelekî li vir mam. De kare xwe bi qerarekîve girebidin lo.
Fihat bege, baxişandina xwe dbcvvast, deste xwe bire eniya xwe. Bi heyşt hezara vve ev kara qebûl bikira. Bi tevayî vve erde gundiyan ji deste axe dendsta. Ev jîji bo xatire Xelef bege qebûl dikir.
Gundiyan heyşt hezar bihîstin, te digot derzî tere kirin. Li ruyen hevdu dinherîn. «Çi dibejî, em çi bikin?» dipirsiyan bi çaven hev. Ni ha şaşbûnek li ser gundiyan bû. Xelef bege got:
- Hûn qerar bidin hela. Xwede je razîbe, eme ji Fihat bege rica bi kin. Hûn feqîrin. Ji bo vve, meriv hinekî dîsa kem dike. Zû bikin. Ev karan penc zede anjî penc kem dibin. Gund vvüo hesa naye, nakeve kefa deste meriya.
Mihe:- Walle me jî Xelef beg ji xwere mezin got û em hatine vir. Gundî ev du şalin perîşanin. Ne mînanî berene. Niha pencî mal tene mane li gund. Levvra em dbcvvazin, gerek gunehe vve bi me be. Ji me re tiştekî kem bikin. Wallehî di deste mede tüne. Hûn nizanin em di çi halîdene? Me zeren sere jinen xwe anîn. Bira qeda sere vvebe. Ye ke me, ji duduye xelqe çetire. Di deste mede tüne, em çi bikin?
Fihat bege got, ku kare wî girane, nikare bi tehrekî dine bike. Xelef beg rabû ser piya.
- Bele, bele, ez jî reca dikim. Ev meriven başin. Pir tişt hatine sere vvan. Bira bi heft hezar û pencsedî bibe ev kara.
Sekinî. Li ruyen gundiyan niherî. Nikaribûn tiştekî bejin. Seren vvan

di berde, sermilen vvan nizm bûn. Kerr bûn.
Xale Mihe:
- Bele, de bira vvisabe. Waxta hûn vvüo dbcvvazin, bira vvilobe. Xelef beg, te wisa gotiye, em çi bejin? Wallehî gelek geleke ji bo me. Le... Çi bikin em?
Fihat beg:
- Na xer. Na xer. Ne geleke. Xelef bege çi xwast, bira vvisabe. Ji ke sen dinere ji deh hezarî kemtir nedibû. Li ber vvî, zimane min negeriya. Nikarim zede bejim. Le, eze niha penc hezara peşîn bistînim. Du hezar pencsede mayî jî paşe.
Xwast ku her tiştî kuta bike. Hinek kaxiz anîn. Gundiyan peçiyen xwe lexistin, mor kirin. Ji bo ku vvekaleta xwe bidin, evv bi lavvike li cem xweve şandin ba noter.
Xelef beg jî çû. Tendûrekî ji noter zivirandine, vve biçûna dikana vvî. Kare vvan li noter zû qediya. Bi şûnve hatin, Fihat beg û çend me rivan, bo devveke merkuştine xeber didan, bihaye devve dibiriyan. We-
166
kalet hilda kire cîkî. Nav nişanen yen dine, di demeke firehde vve bi hata û bistanda. Wexta ku bo keşfe hate gund, vve çaxe jî dibû.
Dema ku pere xwast, Mihe, zeren di destmalekede peçiyayî, ji paşi la xwe dendst. Hûrkirina pera û zeran Xelef dikir. Bi çi diçe zere Reşadî? Bihayen zeren Cimhûriyet bi cine? Fihat ji Xelef begere telefon kir. Je reca kir ku tendurekiyan dişine cem vvî, penc hezar paqnote vvî bira li ba Xelefbe. Xwast bira di davviyedejere telefon bike. Deste vvan girt, vve rojtira dine devve vekira. Li bajer ev kar vve baş biçûna serî. Be şer û be derd vve xwayî erde xwe bibûna. Gerek bi ve bavver biki rana. Paşe dîsa zivirî li aliye nû hatiyan, li ser devva vvan qise kirin. We çaxe zere Reşad çil û neh, pencî paqnot dikirin. Xelef zer bi

çilpenc paqnota hûr kirin. Penc hezare Fihat bege hilda û jere telefon kir.
Kare tendurekiyan xilas bû, le evar jî hatibû. Zeren mayî di paşila Xale Mihede bûn. Pir kar qedandibûn îro. Abûqat girtibûn, pirseke bi bavver je sitandibûn. Peren vvan vve biçûyan, le vve xwaye erde xwe buna. Abûqat vvüo gotibû. Him jî qûşe li axe biqetînin.
Wan salan heft hezar û pencsed paqnot gelek pere bû. Him jî ge lek gelek pere. Di xewna xwede bidîtana, dîsa jî bavver nedikirin. He ma bira tene ji erde xwe û ji ciyen xwe nebûna. Bi tehrekî dine nedi bû. Malen xwe hurneşînin û necin. Li xeribiye, di nav xelqede jin û zar be abur nebin.
Çend sal bûn ku partiyen nû çebûbûn. Demirqirasî digotin û partî çedikirin. Ji bo heqe gundiyan, zuma cendirman, memûren beş kom dikirin, gelek tişt dihatine xeberdane. Gerek kesî zorbetîli ser kesî ne kira. Mirteza doste Ûsiv axa bû. Evv jî di partiyede bû. Le birabe, ci ma xenji wî kesekî dine tüne? Hema di dinede Mirteza tene heye? Tendûrekiya nedbcvvastin ku bi şev li vvir bimînin û pera bidine ote le, aşxane û qehwexane. Hatin ciye ku kamyon, otobos le disekinin.
Bi kamyoneke hatine bajer. Di kamyonede torben çîmentoye û hesinen xanî çekirine hebûn. Re ne baş bû. Di kortikande her quloz di bûn û hesin di ciyen vvanre diçûn, dieşandin. Ji bo ku nekevin, xwe bi texten dore girtibûn, cara seren vvan le diket. Ji bo ku şewqen vvan ne firin necin, hetanî guhen xwe daxistibûn. Re piçekî baş dibû, revviyen ku berî vvan hatibûn li kamyone rûniştibûn, yek ji vvan dest pe dikir, kilam digot. Şev, dereng hatine bajer. Lastiga kamyone teqyabû û guhartina
vve evv dereng xistibûn.
Soro vvan pir vvestiyayî, hâl tede nemabûn. Hatine xane. Di quncikekî

xanede şev derbas kirin. Hîn nebûbûn ku dereng razen. Him jî
167
vvestiyayîbûn, zûtire ketine xewe. Abûqat ji vvanre gotibû, ku qet meraq nekin. Levvra evv jî baş razan. Kare herî baş anîbûne cî û vedi- geriyan gund.
Van rojan Fihat beg gelekî hevvcî peran bû. Pirsen bi bavver û germ dabûne tendurekiyan. Evvjî, bi heviya van pirsan, ketine xeweke giran. Çi bikirana feqîran? Penc hezare vvan zûda çûbû, ciye xwe dîtibû, li ber deyne hesinan anjî çîmentoyan. Pere xwe çavva jî dilop bi dilop xerc kiribûn. Ziken xwe jî bi dile xwe ter nekiribûn.
Dane ser re, ku herin gund. Gundiyen vvan dihatine ber çaven vvan. We çilo bihatana peşiya vvan? Mînanî meriv diçe peşiya mencasan. We evv guhdarî bikirana û deve vvan binheriyan. Bi van fikran him xeber didan him jî diçûn. Li xane derheqe vî karî, ji kesîre tiştek negotibûn. Nedbcvvastin zûtire here ber guhe axe. Meriven wî bira nebihîsin. Le vvakî yek here kare vvan xirab bike?
Ji dûrve gund hate xuyane, be hemdîxwe, gaven xwe sivik kirin. Gi ran giran hatibûn. Xale Mihe kal bû, nedbcvvastin evv bîhnteng bibe. Li ser avan sekinî bûn, bîhna xwe hilda bûn. Xale Mihe, cara deste xwe dibir paşila xwe, zer teselî dikirin. Heke evv nebiya, yen dine niha zûva gihîştibûn gund. Çi bike? Xwede çave kalbûne dence. Taqeta çö ken wî ne mînanî bere bûn. Ka evv rojen bere. Şev û roj re diçû, dîsa jî meriya nizanibû ku revvîtî kiriye. He lez, nezî gund bûn. Günd rind di hate xuyane. Li aliye jere mala Ûsiv axa, baxçe vvî... Li jore mala He sen, Hemzo û mala Eyo. Dûye vvan zirav zirav quloz dibû.
Bîhna Xale Mihe diçikiya.
- Lavvo çi li vve qewimiye? Kafir li pey vvene, berî vve didin, çiye? Hûn dbcvvazin, min bikujin? got, yen dine hedî hedî sekinin.

- Hûn xortin, ne kalin. Dibe vve bîra jinen xwe kiribin? Lo lavvno, kes ji deste vve narevîne, netirsin. Lezeke şûnde hûn li cem vvanin. Hemû keniyan. Soro:
- Xale Mihe, henek li alîkî. Te pir bîra xaltiya Almaste kiriye an na? Tu vve zede hez dikî an xaltiya Beşe?
- Herdu jî yekin. Piştî awqas salan çi ferq dike? Hela hûn jî kal bi bin. Hûne bibinin, hûne ji xortan betir bîre bikin. Eva ne mîna bîranîna civvanane. Wekî hevaltiya salen dûr û direj, mînanî ku meriv hînî hev dibe. Çilo meriv hînî cbcare dibe, le diðere.
Henek dikirin û diçûn. Lebûn teketana gund. Qerar dan. We biçû na malen xwe, demeke bîhna xwe hildana. Xeber bidana cîranan, li oda mizgeftede kom bibana. Paşe, çi kiribûn, çi bihîstibûn, vve ji gun diyen xwere bigotana.
168
Li peş gund, denge traktora nû dihat. Ji serîkî zeviye ledbrist û se re dinere derdiket. Wexta ketina nava gund, denge zaran û heyvvanan tevîhev dibû. Zarok reviyan hatin peşiya vvan. Yek duduji vvan dbcvvas tin ku peşde birevin, li deveriya erde ketin. Di nav tozede man. Pozen vvan bi firtbc, pore vvan hevvîrdor kur kiribûn. Bi pore sere vvanve nivişt anjî hinek isterk û şiklen dine bi hesin, zeliqandîbûn. Li ser namilen vvan, morî û pişkoken bi reng dûritîbûn. Qet li qûna kesî derpe anjîşal tüne bûn. Kirase vvanî direj devvsa her tiştî digirt. Hemû reş û qemitîbûn. Ruyen vvan li ber tave qelişîbûn. Lingen vvan wisa reş bûn, meriyaji xuliye ferq nedikir bere peşîn. Zarok direviyan cem neze xwe. Xale Mihe zar pir hez dikirin, dev û poze ke paqişe, le nedinherî, he mû hemez û maç dikir. Ji berîka xwe şekiren gilover derdbdst, dida vvan.
Dîsa anîne bîra hev, vve çilo bikin. Li ber deren gelek malan jin û

zar bi meraq li vvan meze dikirin. Hinek damîş nedibûn, dipirsiyan.
- Hûn xer hatin Xale Mihe. Xer hatin Soro. Xwede bike hûn bi xer û silamet hatin. Xeberen xere nehe qet? Li mizgefte? De bi xerbe, li mizgeftebe. Bira, bira. Hûn hinekî bîhna xwe hildin. Eme haye bidine hemû cîranan, digotin hinekan.
Paşe di nav xwede:
- Eðer tu li ruye vvan dinherî, çûyina vvan meze dikî... Tiştin bûne, xwede zane.
- Bele, hatina vvan xere nîşan dide.
- Tu nabînî, Xale Mihe jî mîna xortan bi re diçû.
- Tu Xale Mihe nenihere, bere wî li aliye pîranbe, hertim wisa di çe. Niha li male, vve xwe bide nazan. Qet nebeje. Yeke gören wî derxe, ya din vve bi ava germ lingen wî bişo. We beje, vvay, vvay. Of... He la vverin, hinekî pişta min miz bidin.
- Kîjan ne vvisane cima? Hûn wî hildidine ser zimane xwe. Ere ci ma tu ne vviloyî? Nave wî derketiye, digotin.
Ve deme Tendûrek pir xweş bû. Te digot kulîlken, gülen hemû di ne li dora vî çemî rez bûne. Çiya û banî, van rojan heşînin li vir. Henikayîke serîn heye. Germayen ku meriyan diqelîne hela he nîn bû. Wexta şîr, pener, rûn danîne bû. Van rojan dine serîn û xweşe: Kal û pîran, «ox, pişta me piçekî germ bû, dine heye» digotin. Hemû kes bi hevre dikenin û henekan dikin. Keç û xorten ku ji hevdu hez dikin, di van rojande dikarin pirseke dudan bi hevre bejin. Seven zivistane yen direj, cîran çûbûn hatibûne hevdu. Niha hemû kes di nav jiyane û re-
169
vvşeke dinede bûn. Dbcvvastin, jiyan hertim vveha serîn here. Le bele, van rojan jî hedî hedî dest û lingen xwe dikişand.
Dîsa li oda mizgefte... Ve çare her zede kes, bi meraq rûniştibûn.

Ji hemû malan meriv hebûn. Tijî bûn. Hineken ku we roja bere nehatibûn, di nav cîranande ciyen xwe hilda bûn. Bere Soro hat. Cîranan
bi hürmet silav dane. Hale wî pirsiyan û xerhatin gotin. Cbcare fermû kirin. Paşe yen dine jî hatin û çûne aliye jore.
Xale Mihe mînanî ku çîroka dibeje. Wek bûyareke berî gelek salan bere bûye, digot. Çavva çûne dikana Xelef. Li vvira çi dîtine, yek û yek, qet tiştek ji bîr nekirî digot. Paşe derbasî kibaben Edene bû. Tam û bihaye vvan, nîvbirçîmayina xwe jîji bîr nekir.
- Dine dîtiye. Xatire meriyan zane. Heqe kesan, hûqûqa hemûyan baş zane. Xelef beg rabû, kar û tevdera xwe hîşt, bi mere hat. Abûqatekîbaş,
dijvvar. Jîr. Min jere got, paşe Soro got. «Ev çavva dibe? Ça vva erde vve dikare bajo» got. «Be şer û be lexistin, hûne li günde xwe bibine xwayî» got. Xelef bege jî, «ev dosten minin, reca dikim li ser kare vvan baş bisekine» got, jere.
Hemû di meraqede bûn. Çaven gelekan, li ruye Xale Mihe dinhe rîn. Qet nedilipitîn. Nedbcvvastin ku pirsekîjî vvinda bikin, ji xeber- da ne.
- Xwede je razîbe. Şîre helal metiye, got yekî.
- Paşe abûqat got, mizgîniya min ji vvere, «eme ve devve pek bînin. Devven vvüo yen zevî û mergan zû xüas nabin. Direj dikşînin. Le bele davviyede, sedî sed eme biserkevin.»
Dîsa yekî:
- Bira davv: başbe, tiştek nabe, bira hinekî derengbe. Bira tene gund tekeve deste me. Me awqasî sebir kir, cima em nikarin hinekî din jî bi sekinin?
Yekî din:
- Qet negot, vve çiqasî direjbe?

Yekî kal nikaribû peşiya meraqa xwe bigre.
- Oro, hevalno. Hûn çavva di zike diya xwede sekinin? Bise, bira merik beje. Xüas bike gotina xwe.
Xale Mihe dest pe kir:
- Eme ji günden doran, meriven zana bibînin. Abûqate nava çend rojande vve devve veke û keşfe dence. Ji bo vî karî Xelef begjî kete na ve, heft hezar penc sed paqnotî razî bû. Kare gundekiye. Pir mezin û girane. Him abûqatekî bi nav û denge. Digotin, abûqate vveha deh û
170
panzde hezaran kemtir meze nakin. Penc hezara niha, yen dine jî eme paşe bidine. ^
Yekî, duda «vvay bavo, çiqasî pere distînin!», «vvay daye vvay, gerek meriv bbcvvanda û bibûya abûqat», digotin di ber xwede.
Zer çilo kiribûne pere, qal kir. Zeren dine, deste xwe avete ber piziya şale xwe derxist, da peşiya xwe. Hinek jî peren kaxiz. Zer û pere tev, di destmalede peçiyayîbûn. Ji bo keşfa gund paşe vve bihata xerçkirine.
Cîranan qerar dan ku pere, zer li cem wî bimînin. Bi vî teherî hertişt di riya xwede diçû. Le ji nav qelebalixe dengek hat:
Niha Ûsiv axa qet nasekine, zeviyen me dajo. Cima abûqat nikare vvî bide sekinandine? Eve çilobe? Zevî dîsa di deste vvîde. Em jî, ji dûrve, vvekî pişik li goşt dinherin, meze bikin? We vvisabe?
Te digot, nüve ji xewe hişyar bûn. Gava dine awqas tişten baş dianîne bîra xwe, gişt nişkeve çûn. Vedrokek ava sar li ser sere vvande ki ribûn, te digot. Veciniqîn. Hişyar bûn. Bele vvisane, axa erde me, li peş çaven me bajo, em jî mînanî berfa bihare hedî hedî bihelin. Xüas bi bin. Çiye, çi nîne? Abûqate ji mere erde şûnve bistîne.
Xale Mihe li dora xwe niherî. Tûka xwe daqultand. Bersiv ji dev

dernediket. Cîranan dît ku evv vvüo şaş û metele, her zede li ser vî ka rî sekinin.
Xale Mihe, vve gelek tişten baş anîne cî. Başin, baş bûne. Qet ne be, bira Ûsiv axa jî dest nede zeviyan. Wexta em najon, bira evv jî najo-Gava dine, mînanî kesen ku gelek tişt birine serî, xeber dida Xale Mihe. Niha tiştekî bi aqü nedihate bîre. Bilde bilda zimane wî bû. Ti ştek meriv je fem nedikir, dikire mirtinî. «Abûqat got eze pek bînim. Eme ji mehkeme bbcvvazin ku tedbîre îhtiyade bidin ser zeviyan...»
Di davviyede Xale Mihe qal kir ku abûqat ji bo ve pirsek nedabû.
Zivirî li aliye vvan hevalen xwe, ku pere çûbûne vvîlayete. Li heviya alî kariya vvan bû. Soro serî di berde, nedbcvvast bipeyive. Hemû metel û şaş bûn. Çend kesan dbcvvast ku denge evv kesen ku li hember derdikevin,
be birrîne. Mihe vvekî ku elektrik dane cane vvî, ji nişkeve rabû ser xwe.
Bisekinin. Bisekinin. Piştî du roja, zede zede piştî hefteke abûqate be bajer. Dibe be vira jî. Em gişt pere xeber bidin. Betir hesa di be vve çaxe.
Ev piçekî kete hişe gundiyan. Dema abûqat te, we bi tevayî pere bipeyiviyan.
Piştî van peyivan dîsa jî:
Çûn, hemezek zer, pere dane abûqat.
171
Destvala zivirîn, hatin.
Ûsiv axa bi dile xwe zeviyan dajo.
Heyfa peren meyî çûyî, got hinekan. ^
Bisekinin, vve çi lez û beze? Hûn hertim vvehane. Piçekî sebir bi kin.

Bi van pirsan hinekî nerm bûn. Hemû kes, her tişt tevîhev bû. Bi vî hali çûne malen xwe. Hinek şa dibûn, vve be şer û be kuştin li erde xwe bibine xwayî. Dereng bi dest keve jî, dîsa baş bû. Wekî dine nedibû. Pere vvan vve bi çûya. Le çi bikin? Xwede vveha nivîsî bû. Ma di jiyana xwede pere dîtibûn? Wisa hînî ve feqîriye bûbûn ku dikarîbûn ve belengaziye
demeka din jî bikişînin.
Heke ji yen li hember sekinî dipirsî; her tişt tût û rût û be xer bû. Tiştekî vikî vala bû. Le peren vvan, zere seren bûk û jinan... Heviya vvan, ev zeren di hustiye jinande bûn, evv jî be kar û be xer çûbûn der. Ev kara wisa bi hesanî hel nedibû. Heke abûqat be û peşiya çandina Ûsiv axa bigre, dibû. Eðer hakim, beje «ne ji vvere û ne jîji axere», vve çaxe dîsa dibû. Wilo dikete hişe vvan. Bi curekî din nedibû.
Piraniya cîranan bi şik bûn. Bihîstibûn ku mehkeme bi lihevnehatina li ser erd, gelek caran herdu aliyan jî dide sekinandine û erde bi vvan nade ajotine. He jî zanibûn, mehkeme ji deste herdu aliyan jî digre û heta davviya mehkeme, dide yekî bi îtibar. Wekî vveha nebûya, belengaziya vvan vve her biçûya, heta hete. Ji alîkî din dîsa difikiriyan, «mehkeme awqas seren li ser erde, çavva pek tînin? Bi taybetîjî karen mînanî yen me... Mehkeme wexteke bikşîne, keşf vve ben. Şahid û me riven zana, di davviyede, heqe kebe, vve bidine vvan. Ji ve vvede vve ça vva bikirina? Roja peşîn bi def û zurne, vverin ev erde vveye, hûn rast dibejin, nedihate gotine.
Van fikren cure bi cure dihatine gotine. Di nava se çar rojande abûqate vvan hate gund. Fihat beg di jîpeka kevnde hat. Xortek pere bû.
Şewqe li serî, di lingande solen nerm, şale wî ye siyariya bû. Ne bi dilfýreqet
bû. Şoferekî ji bajer, evv anî bûn. Gundiyan şofer nas dikir.

Wexta hatine nava gund, di qasekede hevvîrdora vvan tijî bûn. Kînge ku li Xale Mihe pirsîn, gundiyan fem kirin ku ye hatî, abûqate vvane. Nava gund ji nişkeve pir qelebalix kom bû. Xale Mihe bi lez, bi bîhn çikyayî hate vvir û dît, Soro û yen dine jî li vvirin. Şewqe Mihe di des tde, abûqat silav kir. Xwast, abûqat be hundir, fermo kir, le wî qebûl nekir. We zûtire biziviriya.

Min devve vekir. Ev kar hate cî. Min hakim jî razî kir. Ve şemiye, li zozana Bervvare, keşfa vvir heye. We here vvir. Evve di vire der-

172

bas bibin, herin. He ku payiz û zivistan nehatiye, eze keşfe jî bikim, got. Zivistane pir zemet dibe. Minje reca kir. Memûre qadastroye, vve krokiye, planen vvan merg û zeviyen ku hûn dibejin, çeke.

Di ve deme, li xorte ba xweve zivirî:

Yen ku navnîşanen vvan, ne li cem minin, bira tilya xwe li vir xin anjî mora xwe. Ji bo vvekalete. Wanjîbigîhînime hakim. Heke hûn bikaribin,

çend kesen bi emre zede, yen ku van deran dizanin, bibinin pir baş dibe. Hakim gerek, vvan guhdarî bike. Evv jî bira li vederebin. Paşe bager bû.

Na xer. Na xer. Niha ji vvan meriven zana dest berdin. Ve çare nabe. Nikare vvan guhdarî bike. Krokî û planan bide çekirine, ve çare gund nas bike, besî meye. Ji nihade gerek hûn jî, ji günden dora vve, meriven kal û zana tivdarek bikin. Paşe yen kerî me ben. «Em ji diya xwe bûn, nebûn, em zanin ku ev der yen gundiyanin, ne ye Ûsiv axanin. Evv cîranen hevin.» Gerek vvüo bejin.

Hetanî vve deme, kare vvekaletname qediya bû. Fihat beg dbcvvast, zûtire bifýlite û here. Le yekî xort:

Abûqat beg. Ev Ûsiv axa erde me dajo. Ev kar vve çilobe? We

hema usa vveha bajo?
Fihat beg ji pirsiyara wî qehirî û pirçiye xwe kir. Bere xwast, wî bi qehir bide kerrkirine, paşe bager bû.
We jî difikirim. Gerek bi hakimre bipeyivim. Bi destura xwede eme vve jî texine re.
Ye dine he jî nedisekinî û peşde diçû.
Eman eman bege min. Heke ku evv bajo, paşe hale me vve çilo be? Ez xwe davvejime dest û lingen te bege min.
Fihat beg li aliye şofer zivirî, sere xwe jere bakir ku bira xwe bide ser re. Xorte dine kaxizen deste xwe didane ser hev.
Ber xwe nekevin. Ev kar vve herin serî. Duh yek, îro dudu. Hîn çi bû? Her tişt we be cî.
Ev peyivandin û ev kar gişt nîv seet tene girtin. Jîp di ciye xwede zi virî û dûr ket. Abûqate vvan, deste xwe ji jîpe dendstibû, tendûrekî si lav dikir. Gelek ji vvan hevî nedikirin ku abûqat vve awqasî zûtire be. Ve hatine, dilşayî û bavverî da vvan. Her çiqas hinek pere dabûne jîpe û xorte ku navnîşan kom dikirin jî. Evv nedihatine bîra kesî. Ji rû û ça ven vvan dilgeçî dihate xwendine. Dema gundî dihatine cem hev û ne zî hev dibûn, betir bi hevre serîn bûn û bi zimanekî xweş bi hevre dipeyiviyan.
173
Piştî çûyîna abûqat, kesen dora Xale Mihe qedereke bela nebûn, li dore man. Evv dîsa dilgeş, ser bilind bû.
Çiqasî dijvvare. Xwede zane vvekî şerane. Tu naniherî, çi zûtire keşfe tine gund. Hûne binherin, ev kara pir direj nakşîne. Him jî vve di demeke kurtde pek bîne.
Yekî li cem:
Bele, kifşe. Tu merik nabînî, di kare xwede çiqas jîre? Penc deqîqa

vala nasekine. Te xuyane bavo, te xuyane. WUo dijvvar nînbe avvqas pere vve jere ji ku be? Cima qet bi deste me nakeve? Küre bavan xwendine, ciyen mezin dîtine. Qanûnan giştan jiber zane. Lo bavo, te dît mînanî me şewqe dabû sere xwe.
Yekî dine kenya:
Tu wisa le nenihere. Evv di wexten revvîtiyede, diçine cîkî, vvehane. Tu vvan li bajer bibînî, meriv metel dibe, ava deve merivan diçe.
Em diçine bajer, şewqe û çakete hevdu deyn dikin. Evv tene gunda, ji bo ku xwe ji toz û qireje biparezin, vvüo li xwe dikin.
Ji ve hatine, gundî û Fihat beg dibcvveş bûn. Le bele agir ketibû Ûsiv axa. Dile wî tijî tirs bû û dilerzî. Heta niha di mehkemande kare xwe rind biribû serî. Le dîsa jî ditirsiya. «Eze pek bînim dibejî, meze dikî ku te her tişt ji binîva vvinda kiriye. Hine abûqaten mînanî şeytanan hene. Li ser, bine qanûnan vvüo tev didin ku hişe kesî hünade. Çi di kin dikin devve bi aliye xweve dikşînin. Le vvekî ev küre kere jî wisa bi ke? Paşe vve çavva bibiya hale vvî? Gundî edî evv li gund jî nedihiştin. Careke bi meriya bikaribin, edî her roj li hustiye meriya sivvar dibin.»
Qaymeqam, qumandare cendirman li aliye wî bûn. Le dîsa jî meriv bavveriya
xwe p5 nayne. îro ji tiştekîre «ere» dibejin, sibetire be minet dizivirin û dibejin «na». Revîçû bajer. Bûyeren nû, ji qumandarre got. Oumandar bi dile wî dipeyivî, bîr û bavveriya wî nûjen dikir. Le dîsa jî kurm ketibû hundire wî careke. Kurman dile wî dikola.
Mirtezaye partiya nû dît. Mirteza keder û tirşen Ûsiv axa di cîde nedidît. Di davviyede gundî vve destvala vegeriyan. Kir nekir Ûsiv axa ji sika xüas nedibû. Mirteza, Ûsiv axa hilda, li vvîlayete çûn cem abûqatekî ji vvan û nas. Wexta ji cem wî derketin, Ûsiv axa edî rind fem dikir ku vî erdi kes wisa bi hesanî nikare ji deste Ûsiv axa bigre. Hela

ka paşe vve çi bibe? Eðer pevvîstbe, abûqat vve bihata, teketa devve. Ni ha bi rehetî vedigeriya günde xwe.
Gund vvekî ava zelal bedeng û di hale xwede dijiya. Gundî li hevi ya abûqate xweyî dijvvar bûn. We hakim û memûre ku krokî û planen merg û zeviyan çe dike, bianiya. Çavva hebe vve di davviyede li erde xwe 174
bibûna xwayî. Levvra ne hevvce bû, nepakî û levxistin çebibe. Bira evv nebûna sebeben xirabiyan. Le Ûsiv axa jî li vvîlayete ji meriven zana pirsîbû. Qet sika wî tüne bû... Rind bavver dikir, ev erd yen vvîne. Kes nikare ji deste wî bigre. Memûren bajer jî li aliye wî bûn. Oumandar pirs dabû, vvekî pevvîstbe, vve ji bere xirabtir evv bikuta, bihaveta feleqe. Çavva hebe davvî kifş bû. Evvî di mehkemede vvinda nedikir. Levv ra be aqüî dibû ku bi gundiyanre şer bikira niha. Evv çi dikin bira bi kin, difikirî Ûsiv axa.
Abûqat bi vvanre, ji bo şemiye gotibû. Gundî li benda wî bûn. îro kefşa günde vvan bû. îro hakim û memûre krokî û plana, vve bihatana. Dibe ku hemû kes yek bi yek zeviyen xwe nîşan bidin. Derde xwe be jin. Levvra hemû dilgerm bûn. Geleken vvan, sibe zû rabûn. Rûyen xwe kurkirin bi keren ji tirpanen kevn hatine çekirine, anjî bi cileten ku xwe pe bîst sîh carî bere kur kirine... Evv cîleten kevn, di hundire qedehande
bi peçiyen xwe dizivrandin û tuj dikirin.
Le kar, qet jî vvekî ku vvan hevî dikir, nebû. Wexta abûqat devve vekiribû, hakim ji bo ku navnîşan kemin, vve roje qebûl nekiribû. Levvra abûqat hatibû gund, navnişanen kem tivdîr kiribû. Hakim ji abûqatre gotibû, her tim memûre krokî û plana naye dîtin. We şemiye li zozane Bervvare kefş heye. Heke kare vvir zû biqede û memur jî bi xwere bibîne, dikare krokiyen zeviyen Tendureke jî çeke. Evv jî li ser dil û

xwastina memûre krokiye bû. Fihat bege di dile xwede, firset ev firsete got û spas kir û vve şemiye evve jî pere bihata gund.
Abûqat, careke ji hakim sozek girtibû. Hela he hakim, vve ewraqe devve bbcvvanda û le binheriya. Paşe vve ji herd aliyanre jî, roja mehke me elam bikira. Bi xwe jî vve hinek ewraqen nû tivdarek bikira û bida mehkeme. Davvî edî hesan bû.
Hakim yekî hema hema xort bû. Sale wî ne zede bûn. Roja şemiye, sibe zû, hakim dît ku ev abûqate kemfirset, li wî diðere. Hate bîra vvî, bi xwe qewl dabû abûqat. Tiştek negot edî.
Abûqat baş zanibû ku ne vviloye, vveha naye kirine. Le dîsa jî vvüo kir. Rind zanibû ku mehkeme wisa hesan hesan dest pe nake. Çiqasî zûbe, dîsa jî vve se çar meh bikişanda. Paşe, vve bi mehan şûnveavetin, bihata. Niha vve gundî pe bida kerr kirine.
Hakim, memûre krokiye, nivîsdare hakim û abûqat Fihat beg, xwe dane re. Wexta hatin Tendureke, gundî hemû li benda vvan bûn. Po ze hakim gilover, bejn kin, kincen kevn le bûn. Meriya nizanibû, rengen vvan heşînin an gevvrin. Hakim, dema gundî di vî halîde dît, piçekî şaş bû bere. Gelo cima wisa di meraqede bûn? Cima li benda vvan
175
bûn? Li hatine, di rede virda vveda peyivîbûn. Fihat beg gotibû ku vvî serîk dabû gund. Hate bîra vvî.
Jîp sekinî, bere hakim, paşe abûqat peya bûn. Te digot, evve keşfe çeke, vve ve leze qerare xwe bide. Bi vî tehrî li der dora xwe dinherî abûqat. Hakim şermoke, ne mîna Fihat bege bi teşaxuz bû. Got ku dbc vvaze zûtireji zozana Benvare vegerin. Wememûre krokî û plane, paşe li cem vvan bihîşta ku krokiyen erde vvan çeke. Bi tevayî dîsa bi re ke tin.
Kare vvanî Benvare zû qediya bû. Kevre reş hidûd nîşan dabûn. Evv

der dîtibûn. Ji zanemeren ji herdu aliyan jî pirsî bûn. Memûre kroki ye, kevre reş dîtibû û di krokiya xwede nîşan kiribû. Paşe ji vvir re ketibûn. Memûre krokiye, zanemere mehkeme bû, vve li vegere gotinen şahidan jî bbcvvanda û paşe dîtina xwe ji mehkemere binivisiya. Dema vegeriyane Tendureke, evv qelebalbc dîsa li benda vvan bûn. Him he jî zede bûn. Evv zeviyen ku qal dikirin, nîşanî hakîm dan. Ha kim dît, vve direj bikişîne.

Letîf beg, heke tu jî di cîde dibînî, tu Fihat begeve li vir bimînin.

Te xuyane, vve gelekî bikşîne. Kare min pire. Jîp bira vegere paşe vve bîne. Wisa ne başe? Qisûre meze neke.

Letîf beg hînî van halan bû.

Birabe. Bele. Tu çilo dbcvvazî bira vvisabe. Him jî li vedere bîh na te vve teng bibe. Ya rastî jî vve direj bikşîne. Me careke got «ere». Me qewl da. Hela ka eze çavva bikim? Di bin çavande, li Fihat be ge meze kir. «Me ji ku got ere» digot niherandinen vvî.

Gundiyan bi lava û gazin, tasek avdevv bi hakim dane vexwardine. Evvî nivîsdare xwe jî hilda û bi re ketin. Berî çûyina xwe gazî mbctar û Şükriye nobedar kir. Ji vvanre got, bira alîkariya Letîf bege bikin.

Letîf bege, hinek sikil çedikirin li ser kaxizan. Sekoşe, çarkoşe. Hi nek jî qet mînanî tiştekî nîn bûn. Li dora vvan şiklan, nave cîranen ku xwaye zeviyen dore, meziniya zeviyan, nave vvan deran dihate nivisan dine. Gundiyan bere bi meraq li van krokiyan meze dikirin. Di pîvandinede alîkarî dikirin, virde û vvede diçûn, dihatin. Le bele gundî ne li heviya van krokiyan bûn. Wan dbcvvast ku zevî ne ye Ûsiv axa, ye vvanr bin. Hedî hedî bîhna vvan teng bû ji van çbcîzan. Letîf beg bi krokî çekirine vvestiya. Fihat beg, li ser lingan diçû, dihat. Jîp vegeriya û li ben da vvan bû. Gundiyan dbcvvastin, tiştna ji abûqat bipirsin. Fihat bege

zanibû ku careke meriva rû da dest, edî şûnve hildan ne wisa hesaye. Levvra wisa ji vvan dûr, piçekî sar sekinî ku kes tiştekî je nepirse. Ca ran dihate cem Letîf bege, caran berve ceme piçûk, ji ber gundre der-
176
bas dibe, diçû. Mala axe, traktora ku kar dike, ji dûrve dît. Davviya vî tiştî tüne bû. Tiştekî vikî vala bû. Devva van gundiyen be aqü, tiştekî badilhevva bû. Qet tiştek di deste, vvande nîn bû. Bi serde jî axa, gelek karen xwe di serîde şidyayî girtibûn, heq kiribûn.
Ne tiştekî giran bû, zehmete Fihat bege ev car tene bû. Nava mehkeman her car, çend meh digirt. Heke kare wî yen dine hebûna, dika ribû rapor ji doxtir bistanda û bişanda mehkeme. Çend meh dîsa dibuhurî bi vî tehrî. Ev tişt vvehane.
Abûqat birçîbû, evvî û Letîf bege pener, mast xwarin. Herdu jî, li fýrseteke xilasbûne û çûyine digeriyan. Gundiyan xwast, ku tiştekî şerje bikin, vvan qebûl nekir. Gelek lava kirin ku benceke bikin seleqelî.
Fihat beg û Letîf beg nedbcvvastin ku dereng bimînin. Karen vvan qediya, bi lez û bez çûne cem jîpe ku herin, evv xorte vve roje, dîsa hate peşiya vvan.
Bege min, zeviyen me tene ajotine. Eme çi bikin? Niha ajotinan vvan vve bisekine an na? An jî hema usa vve bi vî tehrî here?
Fihat beg dema ku vve xüas bibûya, hatibû girtine niha. Himjî li cem Letîf bege. Ne nas dikir, ne jî hevale wî bû.
Hûn dibinin, em çiqasî li ser kare vve dbcebitin. Dora vve jî vve be.
Ev çito ciye? Kal û rûsipî disekinin, xort û civvan xeber didin. Neji go tinan, ne jîji guhdarî kirine fem dikin. Tişte vveha beteşe çiye lo? Hûn nabînin ku ez çilo dbcebitim?
Çend kes ketin nava xeberdana vvan:
Evv zare bege min. Xorte. Qisûra wî meze neke.

Abûqat nerm bû hinekî. Firset neda, kes tiştekî nû beje.
De bi xatire vve. Di xerede bimînin.
Bi re ketin. Hinekî peşde jîp sekinî. Fihat beg peya bû, yen dine di hundirde man. Çendek berve wî beziyan çûn. Xale Mihe pirsî. Evva û yekî dine, vve roje pere hatibû cem vvî, evv ji yen dine piçekî dûr xist. Xar bû, di guhen vvande got:
Axe ve çare hinekî bitirsînin. Dibe, ajotina erde bihele. Heke ha kim jî niha baş nebîne ku zevî ji vvîre bimînin... Ji bo me rind dibe. Paşe bi gaven ecele banzda jîpe.
Çend seetan bere, gazî Xale Mihe kiribû, ji bo heqe jîpe û ji bo Le tîf bege sed û pcncî paqnot je sitandibû û dabû vvan.
177
-XXXJiyana
gundiyan tevîhev bûbû, niha jî tişten bexer dihatine xuyane.
Abûqate vvan hat û çû. Gelek krokî hatibûn çekirine. Le tiştek di ha le vvande nehatibû guhartine. Mînanî bi derziyan bîreke bikolin, îşqa çavan retibûn, bi zehmetî li van zeviyan bûbûn xwayî, le niha ne dilgeş û ne rehet bûn. Ne mîna bere bûn. Keviren zeviyan berev kiribûn. Gîhayen
biyanî edî ji zeviyan paqiş nedikirin. Bere hinek heviya vvan he bû, niha evv jî nema bû. îro wisa xuya dikir ku ji bo vvan xera tiştekî tü ne bû.
Ji roja ku dest bi vî karî kiribûn, abûqat girtin û bi Ûsiv axare meh keme bûn, her çûyî Eşo zorbetiya xwe li ser tendurekiyan zede kiribû. Him jî bi tehrekî dine. Car caran günde vvan dabû ber gullan. Bi şev, vvan saeten ku evv di malen xwede bûn, wisa dikir. Tiştek nedibû. Ne mînanî bere bû, tene çend gülle diavet niha. Cara peşîn gundî wisa tirsiyabûn,

vvisa tirsiya bûn... Qet nepirse. Paşe edî hîn bûn. Hinekan got
ku «em teleke li sere Eşo çekin.» Paşe ji xirabiya wî tirsiyan, poşman
bûn. De bira hema gulla baveje. Niha li derve nediman, heyvvanen xwe
jî zûtire dbdstine hundir. Tendurekiyan zanibûn ku ev gişt ji bin sere
Zubed axa derdikevin. Ne tendurekiyan tene, li vvan der doran hemû
yan. Evvî gazî Eşo kiriye, xwastiye, ku tendurekiyan bide ber gullan.
«Ev dine çiqasî qehpike. Çiqasî bebexte? Merivtî çavva bûye penc
pere. Ye ku bave vî daye darda kirine, niha herdu mînanî biranin. Bû
ye dijmine gundiyen feqîr.» digot tendurekiyan û gundiyen wî aliye.
Reşaya şeve vvekî perdeka reş kete ser gund. Hemûyan xebat û ka
ren xwe zûtire xilas kirin. Deriyen xwe dadidan û diketine hundir.
Li günden der doran, kalen ku ji vvan hez dikirin û doste bav û ka
len vvan bûn, hebûn. Gerek çend kes ji Tendureke biçûyana û bi vvan
re xeber bidana. Bira bizanibûna ku bi Ûsiv axare ketine mehkeme.
Dibe rojeke, mehkeme vve vvek zanameran gazî vvan bikira. Tiştekî ze
de nedbcvvestin. Nedbcvvestin ku xwe ji dîn û îmane bikin. Çi dizanin,
hema vve bejin beşe. Van kesen kal dizanîbûn ku ev erd yen vvane. Ti
ştekî bi tirs tüne bû di davviyede. Xwestineke be pere û be zehmet bû.
Ji gund, ke hineken vveha nas dikir, evv şandibûn, ku bi vvanre bipeyivin.
Hemûyan qebûl kiribûn. Cima nekin? Tu xereke vvan nedigihişte
tendurekiyan, le bele ev kara ji deste vvan dihat. Giştan qewl dabûn,
178
ku gava haya vvan bû, vve bihatana. Çavva zanibûn ku evder ye tendûrekiyane,
vve wisa jî bigotana. Ev xeber ku bî vî tehrî dihatin, hürmet
û dibcvvestina tendurekiyan her zede dibû. Wan kesan pirs dabûn, le
bele ke çi zanibû, mehkeme kînge gazî vvan bike.
Demeke şunda hate bîhîstine ku tendurekiyan bi hinek kalen zanamer,

ji günden der doranre xeberdane. Dibe gundiyan anjî meriven
Ûsiv axa, jere gotibûn. Piştî van xeberan, hinekan ev kalan pîroz diki
rin û pesne vvan didan. Hinekan jî digot ku axa û dosten wî ye nehelin
ev kalen zanemer, ji bo tendurekiyan şahidiye bikin. Gotinen vvan jî
derket. Rojeke ji Benvare kalek hat. Dirane vviyen sed salî ji yen xortan
zexmtir bûn. Renge wî gevvr bû. Çendekîbere, tendurekiyan bi vvîre
jî, qise kiribûn. Li hespeke sivvar bû. Nevye vvî, li peşiye, sere hes
pe dikişand. Kete gund. Berve mala axe neçû. Da nava gund. Berbi
malen gundiyan. Te xuyane ku pir caran hatiye û çûye vî gündî. Ji gund
le dinherîn ku te derxin, evv kiye? Paşe evv nas kirin, gundî berve vvî
çûn. Gundiyen vî yalî evv pir hez dikirin. Kes neeşandibû heta niha.
Yen wî nas dikin dibejin, di piçûktiya xwede jî qet derevv nedikir. Di
bejin evv, yen ku li cem wî derevvan dike, rind nas dike. Xvyediye pir
sa xwene. Nevye vvî, gören direj kişandibû ser şale xwe. Gorenen sipî
û bi nexş nexşî bûn. Hevde, heyjde salî û gaveke li peş hespe diçû. Ka
le gem di destde hesp dajot. Sere hespe kişand û sekinî. Yen nezîkî vvî
dibûn:
Way kalko. Ser seran, ser çavan hatî. Tu ji vvir heta vira ser sere
me hatî, digotin, hirmeta xwe peşkeş dikirin.
Di navxerede bin. Lavvo, xwede vve bihele.
Hemû wî nas dikin. Li ser hespeye. Yen tene, deste wî maç dikin.
Ax. Lo lo. Kalbûn ne tu tişte. Tiştekî gelekî be abûre. Ez edî gele ge
lekî kal bûme. Kalbûn, xwede xirab bike kalbûne lo. Re jî piçekî sere
jer bû, vvestiyam.
Soro berve wî dihat. Deste xwe bire peş çeven xwe, li Soro niherî.
Soro he bi lez bû. Kirasekî bi reng li xwe kiribû. Çû deste kale.
Kalke Şakir. Ev çi xortbûne? Ser seran hatî kalke Şakir. Li ser
sere me û ser çeven me hatî.

Sere te û çeven te neeşin, küre min.
Xorte nevye wî tene mabû. Paşe zivirîn evv jî pirsiyan. Evv jî pir dibcvveş dibû ku ji kale vvîre, awqas hürmet nîşan didin, qedre wî digrin.
Kalke Şakir deste Soro girtibû.
Bira destura min bidin. Tu min bibe mal. Tu mevane xwe nabî mal?
179
Soro mînanî qîzen xama şerm kir, he jî sor bû. Sorbûna wî ter ne dikir, bi serda ji fedîkirine vvekî süqeke sor bû. Xort sere hespe di kişand, bi nav malanre derbas dibûn. Soro tu tiştek ji ve hatina kalke Şakir fem nedikir. Gelo ji bo çibû? Di dile xwede bi nerehetîke hesya. Hatineke baş nedbcuya.
Mala Soro ne bilind bû. Li ber derî se selen mezin hebûn, ji bo ku xwe bidine heyvvanan. Jina Soro di hundirde bû. Li ser denge vvan banzda, hate derva. Mere xwe û mevan ku dîtin, leçega sere xwe teselî kir. Sere hespe girt. Soro alîkariya kalke Şakir kir û evv peya kir.
Way bereket bi emre tekeve, lavve min, Soro, got û xwe jorda berda.
Soro mevan hildane hundir û jina wî jî hesp bire tevvle, zîn je kir. Ji ister doşegek û balgî anîn, li ser kulavekî raxistin. Kalke Şakir li ser doşege rûnişt. Bi desten xwe, solen nermik ji lingen xwe dendst. Beroşek li ser eðir bû.
Zaren Soro, di quncike malede, xwe sipartibûne hev, li kale meze dikirin. Jina wî misîn û legan anî. Kalke Şakir dest û ruye xwe şûşt. Nevye wî li ser kulev rûniştibû, evvî jî misîn hilda û desten xwe şûştin. Jina Soro bi tivdîr bû. Qet meriya bavver nedikir, le evve ji kedere dianî, çavva dikir? Pevîstiyen xwe dianîne cî. Avdevv ji mevananre anî, ji bo çay av danî ser kuçik. Kalo hedî hedî dihate ser xwe. Zimane wî vedibû.

Çend cîran jî hatine dîtina kalo. Li peş vvî, li ser cileke rûniştibûn, yen nûhatî. Mîro hat. Jina Soro, dîke vvanî reş bi xwarziye vvî, Elî da girtine û şerjekirine. Zarok ji bo dîk hinekî giriyan. Le dîsa jî hale serjekirine.
Evare, tarî hedî hedî kete ser gund, mevan yek bi yek çûne malen xwe. Him ji Eşoye eşqiya ditirsiyan, him jî dbcvvastin ku mevanen vvestiyayîbira
razen. Gelek ji cîranan jî meraq dikirin, ku gelo ev hatin ji bo çibû? Le dîsa jî tiştek tenegihîştîn.Şîv li dora texte glover, kalo Şakir, Soro, Mîro, nevye kalo bi hevre xwarin. Xwarziye Soro xizmet dikir. Li ser şîve kem xeber dan. Gele tişt hebûn ku ji hevdure bejin. Hale vvan wisa nişan dida. Kalke Şakir, xweşî û şirînayî li ser bû. Mî nanî kalen dine ne şerpeze bû. Henek dikir. Ji jiyan û cane xwe jî pir hez dikir. Piştî xwarine, kalke Şakir ji Soro, hale mehkema günde vvan pirsî.
Li gund, yekîtî gelek zehmete, kalko. Du roja yekin, bi hevre ne. Kar hinekî dikeve reke baş, roja sisya tu dinherî dîsa hemû tevîhev bûn. Yekîtî karekî pir girane kalko. Wisa bi hesanî dest ji hevdu dikşî-
180
nin, qet nebeje. Hinek ji hevalan bi femin. Ev, hevale Mîro gelek başe. Him jî bi dile teye. Carna bi lava kirin, caran bi sebir. Bi vî hali du sal derbas bû, me nehîşt ku nîve gund bela bibe. Niha jî me abûqat girtiye, bi heft hezar û pencsed paqnota. Hela he ji mehkeme gazî me nekirin. Axa jî zeviyan dajo. Kar ku vvilo direj dibe û axa erde me dajo, li gund ji her kesî dengek derdikeve. Hinek dibejin me pere xwe badilhevva
da abûqat. Hinek dibejin, hela saleke din jî em diranen xwe bişidînin, sebir bikin.

Lavve min tu zanî... Xwede jî zane. Dile min bi vvereye. Him jî heqe vveye. Gere meriv ji xwede bitirse, xwede hez bike. Hezkirina xwede jî birazî min, bi hezkirina kesan dibe. Gere meriv cîranan, yen dora xwe, yen dine û hejî zede yen xerîb hez bike. Le lavve min, meriv heke ku ve hezkirine ji dile xwe dûr bbce, edî be însaf û zalim dibe evv kes. Hemû xirabî ji deste wî ten. Levvra küre min, niha gelek nepakî, zordestî ji heznekirine ten. Binher, heke meriv hespe xwe hez bike, qet wî dide ber qamçiyan? Na xer nade. Meriv qet li zaren xwe naxe. Evv rojen zevvace yen peşîn, hevdû hez kirin pir germ û bi dile. Mer û jin vvekî şekir û hingiv bi hevdure xeber didin. Le küre min, ev jî vvisa. Tu ku ji merivan hez bikî, li ser vvan zorbetiye nikarî bikî. Yekî dine jî bike, tu nikarî damîş bidî.

Mîro jî tev xeberdane bû.

Kalko, kare me pir zehmete. Wekî ji nav lepen seran, xwarine birevînî.

Kalke Şakir li aliye Mîro zivirî:

Raste. Raste küre min. Di dile merivande tirseke veşartî heye.

Tirsa serhildane. Careke evv be şikenandin, birazye min... Le, evv jî bi tene nabe. Gava meriv te cem hevudu ev tirs te şikenandin. Careke ku tirs şikest, edî peşî naye girtine. Neheqî bi erdere dibine yek. Mînanî dîvvaren ku hildivveşin. Le çara her tiştî; yekîtî û bi hevrebûn, betirs li mafe xwe xwedîbûne. Lave min hûn vvilone. Kem û zede tendûrekî vvehane.

Levvra ez ji vve hez dikim. Le bele, zarno, kare vve zehmete û be fesale. Niha eze ji vvere tiştekî bejim.

Li ve dere sekinî. Denge wî düerizî. Gişt devvsa neviyen wî bûn. Ni karibû li ruyen vvan binhere. Tegihîşt ku di halekî ne başde bû. Yen ku niha vve beje, bi yen ku gava dine gotin, hevdu nedigirtin. Li hem

berî hev, li dijî hev bûn. Levvra je nedihat, beje. Disekinî û li ber xwe dinherî. Tûka xwe daqultand. Paşe dîsa got:
Gotinen merivan û kirinen vvan, gerek hevdu bigre. Eðer kirin û gotin bi hevre ne bûn yek, pir guh nede wî merî. Kî çi dibeje, gerek vve 181
jî bi cî bîne. Levvra, meriv çi dikare bike, gere awqasî xeber bide. Ne zede. Bi vî halîxweyî kal, lingek di tirbede, cima ez hatime günde vve? Soro, Mîro û Elî bi meraq li heviya gotinen wî bûn. Jin û zaren So ro li aliye dine, dere vvan girtî bû.
Tu ku hatî, bi minre peyiviyî, zimane xelke nasekine. Çûne ji Ûsiv û Zubed axare gotine. Me dît, rojeke Zubed axa hate mal. Wisa zede nedihate mala min. Me got, hela ka ji bo çi hatiye? Dest bi xwastin û qisa xwe kir. Ji min xwast ku ez tevî kare tendurekiyan û Ûsiv axa ne bim. Min jî evv kire devvsa meriva û çend şîret le kirin. Zorbetî ne başe. Gerek meriv dest neveje nane feqîran, got. Ev aliyan qet nedihatine bîra vvî. Qet, qet. Paşe ez dizanim ku ev deran yen vvene. Ez çi bizanibim, eze vve bejim. Evvjî, eðer ji min bipirsin. Min ev ji vvîre got. Evvî dîsa reca kir. Ne baş dibe got, le dbcvvest min bitirsîne. Çend roja be re jî ev Eşoye firar li sere gund kire bela. Te, nebaşiye derdbce li der doran. Hatine, şivane gund kutane, du pezşerjekirine û xwarine. Go tiye, herin kalke Şakirre bejin, deste wî maç dikim, bira tevî kare Ûsiv axa nebe. Ez ji vvîre hürmet dikim, le ev tiştekî dineye gotiye.
Caran deste xwe dibir rûyen xweyî sipî. Çaven wî dibiriqiyan. Ji ça ven wî dostî, germî, hezkirin dirijiyan. Bi van salen zede, ewqas reçûn tiştekî zehmete. Yen ku di devvsa neviyen vvînc, bi vvanre vvüo bi dilgermî
qise dike. Ji bo ve gerek dilekî gelekî fireh, paqiş lebe. Kalke Şakir ya rastî jî dost bû. Deste xwe dibire eniya xweya qirçimok, poze

xwe, dbcvvast ku xeberdana xwe bibe serî.
Gundiyen me civiyan. Zaren me li ber min geriyan, lava kirin.
Bavo me ji şer û bela van kûçikan xilas bike. Tevî vî karî nebe. Ez qehirîm.
Ez tevî kare ke bûme? Hükümet tiştekî ji min bipirse, ez çi bizanim
eze vve bejim, got min. Ez kînge tevî tiştekî bûme? Ji Eşo ditirsin.
Ji xirabiya Zubed axa ditirsin. Ye zevî û gîhayen vvan bide şevvate.
Lema ditirsin. Hûn zanin, Zubed axa ji berede bi me bervvariyanre
cîrantîke baş nake. Ji me hez nake. Evv qewl û pirsa ku min dabû
te, hate bîra min. Li ser fikirîm. Min nikaribû, ji pirsa xwe vegerim.
Min got, ez vî karî bi tere bipeyivim. Bû kuleke, kete hundire min. Heqe
min jî tüne bû, ez gazî te bikim. Ji bo ku pirsa xwe nexwim, xwayî
pirsa xwebim, min li salen xwe neniherî û hatim vira. Gundiyen me la
va dikin. Hemû tiştî ji min dizanin. Levvra ezjî, dilşikestîme, lavve min.
Piştî van gotinan hinekî kuxiya. Bi vî tehrî piçek wext bi dest xist.
Nedbcvvest ku li peş van xortan biketa vî halî. Ji xwe şerm dikir. Ji xwere
kemasî didît. Sekinî. Nikaribû peşde bibe. Qaseke bere kale şirîn,
vvekî müyaketan, xweş xweş dipeyivî. Hemûyan li deve wî dinherîn. Ni-
182
ha, dikire bilde bild. Pirs ji dev dernediketin. Bîhna wî diçikiya. Des
te xwe bire berîka xwe. Destmala xweya qirçimî sendst. Poz, çaven xwe
paqij kir. Çaven wî niha bi mij û duman, te digot ku peşiya xwe nabînin.
Sere wî dieşiya, gej dibû. Wekî zaran, dest bi girî kir. Hesir ji çevan
dirijiyan. Soro, Mîro, Elî û nevye wî dülerizî bûn. Tiştekî tehl û tûj
diçilkiya ji dilen vvan.
Lavakirina zar û gundiyen vvî, evv bekef kiribû. Hemûyan jere hirmet
dikir. Ji rûye vvî, seren vvan di derd û belayede bûn. Axaye günde
cîran, eşqiyaye sere van çiyan bûbûn dijmine vvan. Giştan güne dbds
tin hustiye vvî. Kalke Şakir ne evv kese ku ji pirsa xwe vegere. Ye çavva

bikira? Çi bikira? Tiştekî nece bû. Xwede cane wî bistanda ji vî halî çetir bû. Hay lolo. Yekî ku vvekî wî ji jiyane hez bike nîn bû di dinede. Bi hinekan şaş dihat ku kalke Şakir awqasî bi jiyaneve giredayiye. Le nedbcvvestin, li ruye wî tiştekî bejin, dile wî bişkenin. Le niha, xwe bi xwe mirina xwe dbcvvest. Paşe qerare xwe dabû. Ye biçûya Tendure ke, reca bikira ku bira wî bibaxşînin. Ji bo ku dile vvan nemîne, li peş tendurekiyan dbcvvest, mînanî zaran bigrî, lava bike. Niha lema digiri ya. Ji bo ku be baxişandine.

Soro:

Eman kalke Şakir. Çibû? Piçekî xwe vveha direj bike. Tu gelekî vvestiyayî. Me jî tu dayî xeberdane, got û xwest ku wî li ser doşege di rej bike, alî bike. Deste xwe direjî balgî kir, kalo nehişt.

Na, na küre min. Tiştekî min tüne. Derbas bû çû, got, le dîsa jî denge wî dilerizî.

Mînanî barana bihare bû. Dile min teng bû. Xwede xirab bike kalbûne, meriv vvekî zaran dibe. Caran vveha dike.

Lemba penc numre, li dîrege darda kirî bû. îşqa vve tere nedikir, levvra kesî eşa rû û çaven wî nedidît. Le bele rind fem dikirin.

Kalko, li ber xwe nekeve. Ji xwere neke derd. Em te, ji gundiyen te zedetir hez dikin, hürmet dikin. Em zanin, dile te bi mereye. Levv ra, ji ruye me xirabî bene sere gundiyen vve, eme pir dileşî bibin. Em dikşînin, bira evv nekişînin. Le bele, te em dane serme. Bi van salen xwe, heta vira hatî. Te neviye xwe bişanda bes bû. Cima em te niza nin? Em te nas nakin cima? Bihata û bigota, hal ehvval vvahaye. Kalke min nikare be günde vve zanameriye bike. Zore didine günde me. Heyvvanen

me didizin, dibin. Zorbetiyen dikin bigota, em jîgundîne. Ha

len vveha rind fem dikin.

Soro ev tişt digot. le evvî jî çaven xwe, ji wî direvand. Tedigihîşt, ku kalo cima hatiye. Berxweketina kalke Şakir didît, le dîsa jî dilsar bû
183
Soro. Mîro jî vvisa. Kalen dine nedihatin mehkeme, ji bo ku li hembe rî gotinen Şakire kal derkevin. Tu kesan, zanemerî nedikir li peş vvî. Hemûyan zanibû, evv derevvan nake, heqe kesî naxwe. Levvra fedî di kirin li peş vvî. Ji bo ve bû, Zubed û Ûsiv axa awqasî li ser vî karî disekiniyan.
Levvra Eşoye eşqiya dişandine ser günde vvan.
Kale ku giriya, Elî jî kelogirî bû. Le, be ku bi kesî nîşan bide, neş ren çave xwe ziha kir. Paşe hate ser xwe. Niha, dile vvî, te digot ku vik û valaye. Dile wî dişevvitî û bi şaşbûyîneke giran li dora xwe dinherî. Ji bo kalo Şakir çiqasî kelogirî bû. Kale serin guhdarî dikir, her diçû bi germî evv hez dikir. Te digot, hevale vviye, ne kalekî pîre. Niha, «gelo vve çilo bibe?» tene dihate bîra vvî.
Şev, peleke derbas bû. Eşo û meriven vvîgund dane ber gullan. Ten dûrekî hîn bûbûn edî. Ji nişkeve, bû denge gullan. Kalke Şakir xwe şaş kir. Nizanibû, ku gülle nezîmalene. Zûva tiştekî vveha nedîtibû. Zaren ku di hundirde radizan, bi girî, çaven xwe miz didan û peşde hatin. So ro bi deste vvan girt, nehîşt bitirsin. Evv dîsa birin hundir. Denge gu llan li serhev bîst, sîh deqîqe kişand. Bere xewa kalke Şakir hat, le ni ha evv jî revî. Kale difikirî niha. Yen bûyî fikirî. Dîsa mîna gava dine dilteng, diltenik bû. Sînge wî dieşiya. Gelekî bencvveda, ku bira nebe jin tirsiya.
Zarno, hale vve ne tu hale. Pir xirabe. Ne tu hale merivaye. Wisa neheqî jî nabe. Ev zilme. Ez awqasî jiyam, min rojen xirab û qenc dîtin. Kesen baş û ne baş, hatin û çûn. Meriv her roj tiştekî nû hîn di be lo. Hingî min xwe nas kiriye, ez ji xirabiye direvim. Derevv li dûrî

mine. Min got ku dostiye, qenciye bikim û bibînim. Çiqasîji deste min hat, min wisa jî kir. Min fem dikir ku meriv xirabî û derevvan bi xwastina xwe tene nake. Eðer bbcvvazin, dikarin li peş ve bisekinin. Ez jî vvisame niha. Ji bo van kirinan, dibe, min gelek zehmet nekişandiye. Levv
ra ez bi hişe xwe, bi xwastina xwe, li peş nepakiye disekinim. Ji bo min vveha dibû. Dîsa dibinim ku ji nişkeva qehirandin, hersbûn gelek nepakiyan
bi merivan dide kirine. îşev, li cem vve, van bûyeran nîşanî min
da ku ez di vî emre xwede gelek tişt hîn nebûme. Gava dine ku giriyam, min heviya xwe ji jiyane birîbû. Niha tegihîştim ku hatina min baş
bûye. Heke nehatibûma, min nikaribû van bûyeran bibînim.
Li derve, denge gullan ku dihat, kûçiken gund dievvtiyan, vî yalî û
vvî yalî direviyan. Denge gelek cîranan dihat. Niha hemûyan li malen xwe difikirîn, vve çilo razen? Gund hemû.
Lavve min. Salen hînbûne tunenin. Min rind dît îşev. Xirabî, de
revv, lexistin, kuştin cima dibe? We niha çaven min vekir, vve nîşanî
184
min da. Pevvîstî van bi meriyan dide kirine. Gelek caran her tiştî... De beje, hûne ana çilo bikin? Li hemberî ve neheqiye? Heke ku qet re ne mine, çi hat hişe we,°hûne bikin. Ez, îşev yekî di nav ba û bageredeme, û kalo dom kir:
Şeveke tarî, ba, baran... Paşe her tişt disekine, sahil dibe û dîsa
dest pe dike. Şeveke vveha. Qisûre meze nekin, ez hatim ku hûn min bibaxşînin. Ji ber lavakirina gund, cara peşîn bû, ku eze ji pirsa xwe vegeriyam. Levvra ez hatim. Bi şerm, dilşikestî û poşman hatime cem vve. Ez dizanim, yen ku vve bene sere me, li cem yen vve ne tu tiştin. Pirsa vve jî naye kirine. Her roj eşqiya erîşî gund dikin, zilma axe, be erd û feqîrî... Lavve min, ev yek dîtin û bihîstin jî serme. Min qerare

xwe da. Niha ji qerare xweyî kevn vedigerim. Eze hemû gotinen vve bi nim cî. Eze beme mehkeme. Çi dizanim, eze giştike jî bejim. Ve nekim nabe. Xwede dizane ku cara peşîne eze derevva bikim. Ji kesîre qal nakim ku min ev pirsa daye vve. Eze bejim, ji bo mehkeme ez nabim zanemer. Gundî jî vve ji pesîra min deste xwe vekişîne. Him jî bi ra piçekî rehetbin. Niha, vve fem kir. Jiyan û heqîqeten tûj çilo meri yan tinine re. Tu çiqasî jî bejî, ku «ez derevva nakim, eze li ser pirsa xwe bisekinim». Ne di deste tedeye, küre min. Jiyan be însafe, ji me dijvvartire. Çavva dbcvvaze, me dike wî tehrî. Le bele, ev naye vve ma naya ku hemû xirabiyan bikin û paşe bejin, ku "de çi bikim, pevîstî vvi sa bû." Weha jî nabe. Le hidûde van herduyan, vijdan, aqü û namusa meriyan kifş dike.

Soro:

Kalko, em hînî van kemasiyan bûne. Günde xwe û xwe ji bo me neeşîne. Piştî van salan, naxwazim tu aciz bibî. Ez çi zanim... Davviya gotina xwe neanî.

Na. Na. De vveda here lo. Hineken li cem me zilme bibinin, eme jî sere xwe vegerînin û nexwazin ku meze bikin. Aqle min ve hilnade. Sikir ji xwedere, ezî niha rehetim. Eze beme, ji bo vve bipeyivim. Xwede ji vere dercvv nabeje. Hetanî roja mehkeme ez ji kesîre ya rastî na bejim.

Hemû niha dilgeş bûn. Mîro dît ku kale Şakir sekinî û difikire.

Kalke Şakir, bavver bike çi ji deste me te, em dikin. Em naxwazin xirabî derkeve. Du şalin Ûsiv axa, dest ji xirabiye venakşîne. Gun dî ji feqîriye nikare çaven xwe vekin. Heke ku tu bihelî, hinek vve di du rojande wî bikujin.

Zarno, min bibaxşînin, xewa min te. Sibe zû me revvî bikin. Du se pirsen min dîsa hene, ji vvere bejim. Van derden vveyî tevayî, zeh-

metiye ku hûn dikşînin, xwede zane, vve bi xer bigiheje davviye. Di wexten
vvehade, gerek meriv ji hevdu hez bike. Yekîtî li ser hîmekî xurt
rûdine. Tene, tişten nav xwe, karen piçûk ji bîr bikin, hilnedin û daneynin.
Hûne bibinin, vvekî tüyen peçiyan hûne hevdu bigirin. We du
sala damîş kiriye, hûne hejî bikin. Mînanî xortan ecele nekin. Gelekî
bi aqübin. Şîreten min evin. Car cara difikirim, cima van ji vvere dibe
jim? Dbcvvazim ku hûn bi serkevin. Dile min tiştek wisa dbcvvaze. Dbc
vvazim, hûn jî rehet bin, hûn vî karî bibin serî. Ez jî gotina düe xwe ti
nime cî.
Te digot ku ji hevre gotine. Wan rojan, yen pirs dabûn, kuji bo vvan
zanemeriye bikin, li pey hev qasid dişandin. Digotin ku "me bibaxşînin,
em nikarin." Yen hatî, bi şerm û ber xwe diketin. Gotinen xwe di
bejin û bargiraniye ji ser piyen xwe davejin. Bîhna xwe hildidin.
Her ku yen vveha didîtin, tendûrekî diqehiriyan. Ya qala diziya vvî
ya bere, an jî xirabîke wî digotin û didane çeran. Ji bo kalke Şakir jî:
Ji ruyen xwe şerm nekir. Tirsiya û pirsa xwe xwar. Ditirse ku za
nemeriye bike. Sibe, vve li peş xwede çi beje? hinekan digot.
Çend roj wisa derbas bûn, paşe di nava kare girande, hate ji bîr ki
rine. Eşo jî dest ji kalke Şakir û günde wî vekişand.
-XXXIBihar
diçû, havîn li ser hatine bû. Germ bû. Zeviyen ku gundiyan
nû rakiribûn, çandibûn, edî bilind bûbûn, bejn dabûn. Ter heşîn bûn.
We piştî zeviyen deste bigihîştana. Gundî dibcvveş bûn. Par jî vvüo bû
bû. Zeviyen axe, yen li deste, vvekî evvren heşîn. îsal çandin bi dile her
kesî bûn. We bi bereket bibiya. Vî halî dile vvan hinekî fýreh dikir. Van
nezîkiyande vve çayiran biçinin.

Du şalin, nava gundiyan û Ûsiv axa ne baş bû, le dîsa jî axa bi vvanve nehatibû hemberî hev. Ji zeviyen nû çi hildidan, para axe je dida ne. Wisa dihate xuyane, vve îsal jî mînanî par bibiya. Yekî duda got, em tiştekî nedine axe. Careke wisa pirs dabûne. Me par jî da, heta da vviya mehkeme bira vî tehrî here digotin. Hinekan deng nedikirin. Nav awqas tevliheviyede, dîsa jî li ser kare xwe bûn, zeviye nû ajotibûn. Di wextede keviren vvan berev kiribûn, zû bi zû teselî kiribûn. Jin û zar bi hevre gîhayen zeviyan jibartibûn. Yen hînîxebate bûne, nasekinin. Xebat nan û ava vvan bû. Demen ku gelekî divvestiyan, dil diavetin evven be kar vedilezin. Le hevvekî bîhna xwe distandin, edî her tişt ji bîr di-
186
kirin. Kar vvekî nan û av bû. Be kar nikaribûn bisekiniha. Ji kar vegerandine,
ji zeviyan dihatine gund, heta male, di rede henek dikirin,
hevdu xûlî dikirin. Caran dilhezkirine xwe yen dizî qal dikirin. Caran behsa rojen eskeriye û zevvac xwastinen xwe dikirin. Yen eskerî nekiribûn,
awqasîzede xeber nedidan. Li peş çaven vvan, heta eskeriye ne kin, meriv mer naye hesibandine.
"Hela bisekine, bîhna şîr ji deve te te. Hela here qerewana sibe bbc vve. Raze û rabe. Paşe vvere, xeber bide. Bira onbaşî li peş te bisekine, du sîlla bide bin guhe te. Hela ka dîsa wisa dipeyîvî an na?"
Nizanim cima, le kînge ji eskeriye qal dikirin, an sfllen çavvîşan, an jî pîhnen başçavvîşan dihat bîra vvan. Sere çavvîşanre başçavvîş digotin. Seven direj nobedarîkirin dihate ber çaven vvan. Hemûyan jî zuma es keriye kişandibûn. Levvra kesî venedişart, her tişt ji hevdure digotin. Kesî kemasî nedihesiband. Mînanî tiştekî ku her roj dibe.
Kare Ûsiv axa baş bûn. Motora wî ya nû, pir bi qewet bû. Nedisekinî

û erd daduqultand. Ecele nedikirin, bi fesal dbcebitîn. Şofer diçû mala xwe, rojeke duda li vvir dima. Merivekî baş bû. Kesekî giran bû. Tevî her tiştî nedibû. Kes jî tevî kare xwe nedikir. Yekî bi rûmet bû. Ûsiv axa jîvvilo rehet nikaribû ku pere mînanî xulamen xwe yen dine bipeyive. Pevvîst jî nîn bû, her kare wî bi cî bû. Her tim li cem motore bû.

Motor mînanî qîzane. Gerek le binherî. Eðer wisa nekî, vve di malede bimîne qîz.Meriven male, hemûyan qedre wî digirtin. Xulamen male, «keke» digotin jere. Car caran derheqe bajaren mezin je dipirsiyan. Evvî jî qala Edene û bajaren dine ku le kar kiribû, dikir. Him qedre wî zanibûn, himjîji wî hez dikirin. Oedirzanîn, be dibcvvestî nabe. Oedirgirtin, hevdu hezkirin ku bi du alîbe, dijî. Evvjî di demeka kurtde hînî mala Ûsiv axa bûbû, te digot, yekî ji maleye.

Gelek caran, çîroka Ûsiv axa û gundiyan ji xulaman û meriyen ma le bihîstibû. Her çare jî dîtina xwe qet nîşan nedida û guhdarî dikir. Xulam li dijî gundiyan dipeyivîn, evv di ber xwede dikeniya, «gelo ji dil dibejin» digot di dile xwede. An jî van xulamen feqîr, heqe vvan tene tera zike vvan dikir, gelo bi wî bavver nedikirin, levvra vveha qise diki rin? Guhdarî kiribû, bi dostî xwastibû rastiya vî karî hîn bibe. Tegihîşt ku van xulamen belengaz gelekî bi axaye xweve giredayîne. Dijî gundiyanin.

Ya xirab jî, ji bo çi li dijî vvan bûn, ev jî nizanîbûn. Dijminîke behemd û nezanî. Dibe, wisa hînî vvan kiribûn. Bihîstibûn û bavver di kirin ku li van deran erd ye axanin, ji bereve jî wisa bû. Wüo bîr û ba vverî dikirin ku erde gundiyan nabe. Qet qet nebiye jî. Di çirokande,

187

di kilamande, gotinen mezinande erd hertim ye axan bûn. Tendureki yan ku serî hildabûn, xulaman he dizanibûn, evv U hemberî edet û toran

derdikevin. Neheqiye dücin, Rewşa gundiyan xirab dikin. Evv hîn nekiribûn ku bifikirin. Ya rastî, hîn kiribûn ku xenjî van dîtinan, bira tiştekî neynine bîra xwe. Ûsiv axa erd dabû gundiyan, bi wî erdî diji yan. Niha li dijî Ûsiv axa derdiketin. Neheqî bû. Xulam vveha difýkiriyan. Ji bo vvan, dine ji ber dere Ûsiv axa dest pe dikir, heta gom û heyvvanen vvî direj dibû. Ji vvira jî diçû kare xermanan, simbüen genimen zeviyan û çera heyvvanan. Dinya vvan carna fireh dibû. Evv jî zevî, heyvvan
û günde axayen nû bûn. Guhartina vvan hemû ev bû. Diçûn û di hatin, hemû peyîven vvan li ser gund û jiyana axaye vvan bûn.
Di vî günde mezinde dibistan nîn bû. Heta du sala bere, sed bîst mal bûn. Dîsa jî kesî qala ve pevîstiye nekiribû. Qaymeqam demeke li ser sekinîbû. Cîkî baş li peş gund, hine erd ji bo dibistane qerar dabû û kevir bi gundiyan dabû kişandine. Xwe hat, paşe hine memur şandin ji bo vî karî. Qet filitandin nîn bû, dibistan vve bihata çekirine. Hu kumate wisa xwestiye. Günden be dibistan bira neminin. Hemû gund, vve dibistanen xwe bi xwe çekirina. Hukumat feqîre. Devvlet feqîre. Heke bi heviya devvlete bimîne vve gelek dereng bikeve, gotibûn. He mû gund bira bi xwe çekin, binine cî. Yen hukumat re dibirin, vvan sa lan gelekî li ser vî karî disekiniyan.
Li günden deste, gelek jî hatine çekirine. Yen riyen vvan rind, dar û çimento bi hesa dihate kişandine... Li günden çiya, mînanî Tendu reke nîv dest û nîv çiya, dibistan çekirin wisa baş nediçû. Dîsa jî ciye devvsa dibistane kifş kiribûn. Hemû malan bi ereben ga, kevir kişan dibûn. Dest û piyen vvan bi keviranve tîş tişî bûbûn. Karen xwe hîştibûn, li pey keviren dibistane ketibûn. Levvra hemû diqehiriyan. Ji tirsa qaymeqam û cendirman kişandibûn. Yen kal:
Ev dibistan çi peşene? Ye ji mere çi bikin? Ji küre sere me kiri

ne ve xezewe? Derde me cima ne besî meye? Zeviyen me hişk dibin, em pere nagihejin. Şev û roj vverin keviran bikşînin. Çiya û banî negotî, keviran bikşînin, ha bikşînin. Dibistane çi bike ji mere? Ji çi mere dibistan? Be dîn û be îman je derdikevin. Li dibistanan, zaren me be edeb û be töre dibin. Na bavo, na. Ne dibistane dbcvvazin, ne jî tu tiştî. Bira me rihet bihelin, gotibûn.

Gundîjî be dilin. Olam didîtin ev kara. Paşe hedî hedî, «çi heqe hu kumate heye ku bi zore gundiyan bide xebate, ye çeke bira xwe çeke, dema olamiye derbas bû, niha demirqirasî hatiye...» digotin di nav gundande. Kare dibistane hedî hedî şist bû. Hukumate jî dev je ber-

188

dabû. Wan rojan Tendurekiyan di nav xwede pere komkirin, rişvvet dane nivîsdare qaymeqam ku bira dibistan neye çekirine. Dibistan ha te bîrkirine. Çû û çû. Niha li devvsa ciye dibistane kevren kişandî vve kî dîvvarekî bi rez disekinin. Kes jî dest nade vvan.

Ûsiv axa piçekî dixwend û dinivisî, le ne baş. wexta hukumate evv şandibûn rojava, hîn bûbû. Tera wî dikir. Bername û name hedî hedî û dereng dikaribû bbcvvîne. Hinek reqem û hesavv jî pere dibû. Küre vviyî mezin jî vvisa. Ye piçûk neşandibû dibistane. Pevîst jî nîn bû. Ye bbcvvîne û bibe çi, digot. Yen dbcvvînin paşe ji re derdikevin, gura mezinan

nakin, li hemberî de û bavan disekinin. Levvra nedbcvvest. Li ve jî peşdetir, yen dbcvvînin, diçin li bajaran cî dibin. Ji de û baven xwe dûr, dibine hine kesen nû. Car caran Ûsiv axa difikirî, digot, baş bûye ku dibistan li gund nehatiye çekirine. Paşe vve çilo serederî bikira. Xwede neke, xwede necirîne.

Ji bo çekirina dibistane, biniya gund, bin re, ciyek veqetandibûn.

Kevir li vvira, li ser hev rezkirine niha. Erde gundî hemûye. Levvra qaymeqamji
bo ve dere qerar dabû. Baxçekî fýreh. Ciye dibistane û li cem
vve jî malen mamosteyen dibistane. Bi vî tehrî cîkî fireh digirt. Hemû
heyvvanen gund, bi salan, di vire çûye û hatiye. Levvra teda peyn zef
bû. Hemû kesan jî zanibûn, ev dera pir bi berekete, zede dide. Dbcvva
zî teke zevî, teke baxçe, çavva dbcvvazî wisa bike. Hezdikî zebeş û petbcan
biçîne. Genim bi bejna merivekî bilind dibû. Simbelen vve bi bihusteke
dibûn, ku bihata reşandine. Heta vve roje kesekî dest bi ve de
re neda bûn. Heqe kesî jî tunebû. Male gundî hemûyan bû. Paşe dibe
ku hukumat rojeke dîsa dest bi çekirina dibistane bike. We nepirsiyan
cima, ka erde vve, ka keviren ku hatine kişandine?
Ûsiv axa qerar dabû, ve dere bike zevî û bajo. Hema bira memûran
tiştek negota, ye dine ne tiştekî giran bû. Xwest û fikirî, traktora xwe
teke mene, memûren ku ye kerî wî bene, gazî günde xwe bike û çend
benca bi vvan bide xwarine. Bi piraniya vvanre dost bû. Le dîsa jî gere
meriv dostaniye zû bi zû, nû bike. Zeman gelek tiştan bi xwere dbcvve,
kem dike, dostaniye jî pere birîndar dike. Bo ku dostî kem û birîndar
nebe, gere be alaf kirine, avdane. Gere dostî bi vî tehrî xurt bibe. Ci
ma her tişt jî ne vvisaye? Jiyan jî. Gere meriv wext û devvrane bi kerî
xwe vegerîne. Dema çû bajer, yek bi yek serî li vvan da û got. Midire
maliye îsmet bege jî xwestina Ûsiv axa qebûl kir. Mede wî ne baş bû,
zike wî gelek caran dieşiya. Xwarin nediheland. Roja şemiye, li devv
sa Ûsiv axa, qumandare cendirma du jîp kire kir û mevan anîn Ten
dureke. Ji jîpa peşîn qaymeqam, midire maliye, reîse şiba eskeriye,
189
memûre tapiye û yekî nenas peyabûn. Li dû vvan, ji paşiye, nav vvande

nîv perçiqandîbûyî, memûre nifûse banzda jere. Nave wî danîbûn, «ezebe havîne, be bermale havine». Di jîpa dudade, qumandare cendirma,
seroke belediye û çar memûren dine hebûn. Bo ye nenas, «mi dire dibistana navîn» got qeymeqam.
Raste rast hatine baxçe. Di nav darande xalîçe, doşirme û doşeg raxistibûn.
Balgî danîbûn. Av di nav daranre derbas dibû. Li ser riya ave hine golen piçûk çekiribûn. Fekî û heşinayî kiribûne vvan golan. Wan çend deqîqen vvestiyayî derbasbûn, giştan çaketen xwe dendstin, bi daranve darde kirin. Ji bo yen ku nedbcvvastin li erde rûnin, çend îstol anîbûn. Evv jî heta davviye vala man, kes le rûnenişt. Küre axeyî mezin û şofer xizmet dikirin. Bo tiştek ji male be, bi dengekî bilind xulamanre gazî kirin tere dikir.
Ji vvan vvede, du berx bi tevayî, li ser agir diziviriyan û rûn je dunuqutiyan, diçiziriyan. Herek di deste vvande xeyaren teze, him dbcvvarin him jî pijandina benca meze dikirin. We lezekî şunda bbcvvarana. Xeyar bi qalikanve dbcvvarin. Bi çavan ter dibûn.
Li erde rûniştin. Bene, fekî, heşnayî xwarin û bi pere reqî vedbevvarin. Seren vvan bi kef dibûn, hedî hedî di bin darande xwe vedüezandin. Henek dikirin, dikeniyan. Giştan davviyede pirs dianîn li dora eze be havîne, memûre nifûse. Midire maliye îsmet beg, mede wî dieşiya. Piçekjî goşte bence xwar û hinek jî reqî vexwar. Bi midire tapiyere he nek dikirin, «dijmine bencan», digotin jere. Bencek tere nake digotin, le kesî bavver nedikir. Dîsa jî vve roje, sisya yek par ji benca tevayî xwar û qasî vve jî reqî vexwar. Sîniyek dihat û yek diçû. Li bajaran tene me riyan dikaribû awqasî bi cure xwarin û tişt biter bikira. Nîv senevveş bûn, bi debancan nîşan digirtin. Debanca midire dibistana navîne, ya

hinek memûren piçûk, tunebûn. Ye ku çave meriya pe digirt, midire tapiye bû. Kem vexwaribû, dibe ji vve bejî. Desten yen dine diricifiyan û gullan ciye xwe nedigirtin. Ev çend meh bûn, awqasi kef nekiribûn. Gişta wisa digot. Derva, ava sar, hedî hedî vexwarin, dilkefî dabû vvanan. Wisa pir serxweş nebûbûn, der dore xwe nedilevvitandin. Piştî nîvro, bi jîpan çûne ber ceme mezin. Di ciyen kürde, qedera seheteke avjenî kiribûn. Ûsiv axa bi vvanre bû, tev sobanî dikirin. Henikayî, rehetî hatibû cane vvan. Di vegerandine, dîsa birçîbûn. Xwastin, hine kî dîsa vexwin. Wana jî wisa kir. Roj edî le bû here ava. Ji ceme me zin, bo vvana masî girtibûn. Masî dbcvvarin, li ber xüaskirine bûn. Piştî çûyina mevanan, Ûsiv axa û xelqe male, di nav xuyede mabûn, vvestiyayî, «ax, lo çûn, em jî xilas bûn» digotin.

190

Tu deng û behsa abûqate tendurekiyan tunebû. Hema hema havîneke direj diqediya. Hela he careke jî, mehkeme gazî kesî nekiribû.

Pere vvan çûbû. Axe zevî ajotibûn. Bavveriya vvane evv çend rojen peşîn jî pere çûbû. Axa, li peş çaven vvana, hemû memûren bajer gazî gund dike, bencan pe dide xwarine, reqiye dide vexwarine. Te digot ku nîşa nî vvan dide, «binherin ez avvhame, hemû li aliye minin.» Wan bide bihecandine,

terqandine. «Eze vve giştan texime quleka teng, zûtire na,

hedî hedî û yek bi yek vve hemûyan bikujim. Bi dilop dilop hûne bimirin.

»

Heftekî piştî ve bûyere, sibeh zû, gundiyan kare xwe dikirin ku he rin ser karen xwe, zeviyan û mergan. Hinekan heyvvanen xwe tevî naxire dikirin. Nişkeve traktora Ûsiv axa dîtin. Li bin re, evv ciye dibis tane dajot. Traktöre, gişt qehirandibûn. Li peş çaven vvan, te digot agir diçirûse. Ji koka hustiyen vvan, ji bin guhen vvan şûjin tere dikirin. Di

ne li peş çaven vvan reş bû, tevî hev bû. Ji gund deng û qîrîn bilind bû. Wekî ciyek dişevvite. Wekî li ser gundde girtine. Wisa nişkeve bû ku kes nizane çilo dest pe kir. Ke dest pe kir? Yen diçûne kare xwe, zivirîn. Heyvvanen xwe hiştin. Diçûne malan, dar û şiv didane deste xwe. Didane çera, berve nava gund dihatin. Wexta fikirandine nîn bû. Te digot, ji dile vvan, yek dibeje ku «de zû, de zû, hûn heviya cine, hûn çi disekinin?» Kef li dora deven vvan ketibû. Deste hinek jinande keviren mezin hebûn. Derbekede mal gişt vala bûn. Li nava gund kom bûn. Hela le, hela le. Tu be namûse dola be namusa binhere. Wekî ku de û jine mere dide xebera. Hatiye îcar jî, peş malen me dajo. Devv sa ciye dibistane... Male gundî tevayî. Ev çi be abûriye?
Eze deve mezine te û peşiye te... Ji mere şerma girane, tu heta niha dijî. Hela le meze. Hela. Tu diya me nî, cima ji ve ne çetire?
Eze te jî, traktora te jî...
Gujîniyek, qîrîniyek bilind bû. Ke göte û çavva bû? Serejer, vvekî selafeke qetiyan. Nişkeve gijinî hat. Ji ser malan, xaniyan banzdidan, diqîriyan. Qîjînî li berve zeviye kişiya. Li ser traktöre, şofer, caran li ze viye û caran li dora xwe diniherî. Denge gundiyan bihîst. Dît, li nav gund kom bûne. Deste vvande şiv û dar. Serejer dihatin. Serîk ajot, çû û zivirî. Zûtire fem kir, berve wî tene. We wî perçe perçeyî, qît qîtî bi kin. Xilaskirina xwe û traktöre tunebû. We leze bend kişand, gîsin he mû ji erde dendstin. Bi pulbceve, lez peş da çû. Dît, hale wî dîsa jî baş naxuyane. Hesine nava motore û pulbce kişand û hilda. Niha tene bi motoreve bû. Gaz daye. Vîtes guhart. Xwe da ser riya Zîlane. Li pist xwe toz û duman hildida. Carna jî pare diniherî. Hinekan ditin ku evv
191
dûr dikeve, li pey reviyan, le negihîştine. Paşe jere dane çera, dûrve kevir avetine. Wüo gelekî netirsiyabû. Hatina vvan zû dîtibû. Rind hesavv

kiribû. Bericaf, zûçûyîna herî peş dabû motore. Zanibû gundî zû tire nikarin bigihen. Wisa jî bû. Gundî, hatine cem pulbce, evv vvelgerandin.
Bi keviren mezin çep, rast lexistin û dîsa vvalgerandin. Dîtin, vvisa hesan naye şikestine, hîştin û çûn.
Çi bû, vve lezede bû. Küre axaye mezin, li cem sûra dor xermanan, berve traktöre dihat. Nişkeve sed, sedpencî metro vvede dît ku şofer diqîre:
Gundî... Gundî...
We waxte küre axe li şofer diniherî. Jiyana şofer di tengasiyede didît, le ya xwe qet nedihanî ber çavan û ji bo xwe nefikirî. Di vî dema kurtde, gundî gihîştibûne ser re. Di deste vvande kevir û dar hebûn. Tirsek nişkeve kete dile vvî. Tirsana ricifî. Xwede kir, ricafa xwe, wî bi xwe tene dît. Zer bû, li eniya wî dilopen xudane çebûn. Eðer wî lezî bireviya, dibe ku xüas bûbûya. Ji tirsa nereviya. Taqeta reve di xwede nedît. Nava çend saniyande qerar bida, dibû. Le evvî xwe şaş kiribû, di ciye xwede mabû. Bi vî halî qedera deqîqeke derbas bûbû û her tişt fem kir. Ve çare jî, rev ji xwere ne baş dît. Nexwast, nave reve bîne ser xwe. Mer gerek vvüo nebûna. Paşe vve biketa ser zimane gundiyan. Ana, bbcvvasta jî edî rev nedibû. Çend gundî jî, bi riya nava mala vvan û gundve dihatin. Evve peşî le bigirtana! Dît, gundiyan pulbc du cara vvalgerandin, kevir lexistin. Çaven xweji vvan qet nediqetand. Vegeriya û li aliye dine meze kir. Traktör edî dûr bû. Yen ku kevir davetin, nikaribûn bigihejin. Di ciye xwede bisekiniya, dibe ku ev bûyer nedi bûn. Gundiyan pulbc vvalgerandin û bi keviran ledbdstin, wî evv zanîbû ku kevir li bedena wî dikevin. Ji hundire vvî, ji dile wî yekî digot ku he re vvir. Çiye bi hesinan bihata? Gundî ji vvedere çûbûn jî. Le evv xwe çend metro berve vvana nezîk bûbû. Hişe wî gelek di cîda bû. Her tişt

rind dihate ber çaven vvî. Dar û şiven vvan bilind dibûn. Didane xeberan. Evv çeren vvane mînanî gullan giran, guhe vvîdene. Kevir di ser se re vvîre çilo derbas dibûn. Paşe eşeke giran kete heta vvî, çîpa xwe, sevika xwe nikaribû bi xwere bikişîne. Paşe, sere vvî, singe vvî...
Jîp düeqiya, evvî çaven xwe vedikir. Hişe wî diçû. Çaven wî reşve dihatin. Yen cem xwe nas nedikir, çaven wî dîsa dihatine ser hev. Çaven xwe ku vekir, li dora xwe, dîvvaren sipî dîtin. Dîvvar li dor vvî diziviriyan. Hinekan kincen spî li xwe kiribûn. Rengen vvan, şelî didît. Hine şûşe... Xenji vvan çenden dine dît. Te digot hinek qalpaxe çaven vvî dikişînine jere û digrin. Sere wî di nava du hesinande dişidandin.
192
Çaven wî dbcvvastin derkevine derve. Demeke şûnde çaven xwe dîsa vekir, ve çare betir didît. Her tişt edî kem tevîhev dibû. Xwast, deste xwe bibe sere xwe. Deste wî ranedibû. Gelekî dieşiya. Linge xwe dilipand. Ne mînanî mile wî bûn. Dikaribû bikşîne jore. Le te digot, barekî giran li ser hebû. Paşe hedî hedî, çi bû, çi nebû dihate bîre. Le he mû ji hevdû qetyayî dihate ber çaven vvî. Sere wî peçandibûn. Di torbekî lastîkde bûz dabûne ser. Nedihîştin xwe büipitîne. Milekî wî nedüiviya, ye dine jî, bi şûşa seromeve giredayîbû. Mînanî ku bi ciye vvîve zeliqandibûn.
Çend rojan şûnve, doxtoran got, edî dikarin mile wî terane alçiye. Müe wî kişandin, vvekî cane wî derdiket. Pemû li mile wî peçandin paşe. Bo eşe derzî lexistin, le qet tu kar nekiribû jere. Leganekede, di nav ava germde, bi kirece hasilkirî, pînen peçandine hebûn. Bi vvan çend car berjer û berjor, mile wî peçandin. Sere peçiyen wî li derve mabûn. Paşe mile vviye di nav kirecede, bi hustiye vvîve darde kirin, qeyda vve roje li ser kirece nivisîn. Bûz li ser sere wî kem dibû, diheliya, dihatin teze dikirin. Piştî alçiye, bi alîkariya derziyan rehet rehet

razabû.
Yen dora xwe, hemû nas dikir edî. Destur dabûn, hedî hedî xeber bide, le bele ne awqasî zede. Wan rojen peşîn, bi xweve çûbû, levvra bi eşa sînge xwe nehesiyabû. Bi zehmet bîhn distand. Hustî, het, pişta vvî gişt di nav birînande, jan didan. Wekî hevîr û palaxe bû. Di kîjan alîde bihelî, vve bi wî alîde biketa. Diya wî ji ber sere wî neqetiyabû. Di destekîde destmala şil, cara digiriya, caran rû û eriiya küre xwe paqiş dikir. Doxtor ku diçûn, bi çaven hesir, ji hemşîran û yen ku nexvvaşan dinherin lava dikir.
Hûn çi dibejin? Küre mine xüas bibe gelo? Ez qurbana vveme, ere vve xilas bibe?
Paşe xwe nedigirt, dîsa digiriya. Evv, li ve jinika herdu çaven vve vve kî du kaniyan, diniheriyan û gunehe vvan pe dihat. We dîsa: Ne hesaye. Dile diya, biborin. Ere vve xüasbe? digot. Wan gelek caran kare xwe dikirin û dizivirîn, çend pirs jere digotin.
Netirse, xaltiye. Netirse. We xilasbe. Ev çiye? Me yen, ji küre te xirabtir dîtin. Bi linge xwe çûne malen xwe. Tu jî. Te çend rojan şûn ve bibinî. Diya wî dîsa herdu desten xwe bilind dikir, di nav leve xwede dua dikir.
Xwede... Xwede. Ez qurbana te xwedeyime. Evvîji minre, ji jin û zare vvîre bihele. Xwede, Xwedeyo.
193
Evv herdu rojen peşîn Ûsiv axa jî, ji ber sere küre xwe dûrneket. Kü re wî ku hate ser xwe, Ûsiv axa zivirî gund. Kes li gund nîn bûn. Kare vvî li bajer hebûn. Her tişt li hev vvaliyabûn. Bo karen xwenî dine, bo gundiyan ku xwastibûn küre wî bikujin, çû bajer.
Diya vvî, li ser kursîkî, bi nîvcî rûniştibû, dest û mile küre xwenî neşikestî miz dida. Li ser gotina doxtiran, nedihîşt küre vve pir bipeyive.

Li ser pirsandina küre xwe, vve dûr û direj bersiv dida vvî. Bi vî tehrî nedihîşt, evv zede xeber bide. Alçî vvekî keviran hişk bûbû, wî bi des te xwenî dine ledbcist caran. Şaş dibû, kireç çilo avvha hişk dibe.
Wax, wax... Küre min, tu ji küre ketî nav vvan zaliman?
Küre vve nedikaribû bîne bîra xwe ku ev bûyera çilo bû. Ji diya xwe pirsî. Doxtiran di derheqe vve roje gelek tişt je pirsiyabûn. Qet tiştek nehatibû bîra vvî. Doxtirekî «torbe büze» xwastibû, çend derzî lexistibû. Niha, dîsa jî qet tiştek nedihate bîre.
Wan güren har, hatine dora te. Traktör dûr ketibû. Xüas bûbû.
Min ji bave tere got, «evv ciyen me çandine, cima tera me nakin?» «Tu çi zanî?» got. Cima tu bave xwe nasnakî? Min jî zimane xwe girt. Te vî kare wî nebûm. Tu li bintara sûre bûyî. Me hevî kir ku tu beyî ma le. Em çi bibinin nişkeve? Tu berve koma gundiyan diçî. Deste tede ne darek, ne jî çekek hebû. Wekî selafeke, di destande kevir û dar ne zî te dihatin. Bave te qîriya. Debancaxwe kişand û reviya. Tu zanî, pi ştî vve roje, bi destekî nikare debance bikar bîne. Gulek dudu teqand. Evv he jî xûlîbûn, qehirîn. Min tu nedît. Tu li erde bûyî. Te desten xwe li ser sere xwe şidandibû. «Li min nexin, li min nexin» te digot. Paşe çi hate bîra bave te nizanim, debance kire paşila xwe. Dihate cem te. Çendek hatine peşiya wî jî. Le bele xenji çeran, peşda neçûn. Min xwe avete ser te. Nehîşt, ku li te xin. Soro, ye dora xwe didehfandin, dûrdbdstin
ku te bipareze. «Lavvo hûne merik bikujin. Weyek hildaye nav xwe. Hûn çi bevicdanin...» digot Soro. Paşe ji deste yekî, dar sitand. Herdu çîpen xwe vekir, tu hildayî nave. Tu paraztî. Tu li erde direj kirîbûyî. Çend kevir jî li min ketin. Diya te qurbana tebe. Xwezüa gişt jî li min ketana, tiştek bi te nebûya. Tu vvek ku xweve çûbûyî. Dinalyayî. Çend hevv jî li Soro ketin. Paşe bave te jî hate cem me. Dema ku tu dîtî,

ricifî. Dîntiya wî girt. Bo debance, deste xwe bire paşila xwe. Yen dine jî vvekî güren ku ter nexwerî, bi dijminî le diniherîn. Didane xeberan. Yalek dine jî dîntiya bave te.
Rind kiriye. Ax gere du se hevv velezandina ku... Ax, çi bexte?
Ax... Ji vvanre namîne ev.
Tu nepeyîve. Bisekine küre min. Nepeyîve.
194
Maruf ruye xwe li ale dine zivirand. Diya wî jî rabû çû, destmala deste xwe şil kir. Eniya wî mizda. Torbe büze bi destan teselî kir. Nî vî nîvî helya bû.
Paşe diya vvî, çilo küre xweyî bi xweve çûyî anîbûn, nobedar xeber dabû bajer, jîp anîbûn, çavva cendirme hatibûne gund, yek û yek ji kü re xwere qise kir.
Doxtire bajer tiştek kire mile te. Çend caran bi qîrîn gazî te kir.
Deng ji te dernediket. Birîna sere te peçand. Bin çeven te wisa reşheşin bûbûn ku se carî qasî niha. Her deren te bi birîn bûn. Mile te, vvî yalî û vî yalî diket. Şikestibû. Textikek dane cem mile te, bi pînen sipî peçandin. «Li vir nabe, zûtire bibin vvîlayete, nexweşxane» gotin. Emjî hatine vir. Ez wisa tirsiyabûm... Te qet qise nedikir. Te gotin nedibihîstin.
Sikir ji xwedere, tu niha başî. Ne vvisane küre min? Tu başî ne?
Li rûye küre xwe niherî. Çirmisî û melomestoyî bû. Du se hesir ji çavan jerde hatin xware. Hemşîra bilinda zerîn hat bûz guhart. Agire vvî pîva. Havîtandina damaren vvî, li kaxizcn ber sere wî nivisî bi qelemen sor û heşin. Diya wî küre xwe neda xeberdane. Çend sehetan bi xewre çûbû. Dema küre vve palda, evv jî li ser kursîkî, sere vve li ser ci ye Maruf, hinekî benijî. Hişyar bû, dest û rûyen xwe şûşt. Bi denge ava

qurne küre vve jî hişyar bû. Wexta xwarine bû, xurege wî anîbûne ser ciye vvî.
Çend rojan şûnde, doxtirne dine hatin. Derzî li bin peniya vvîre ki rin. Bi çakûçne lastik, li mile vviye neşikestî û çoke wîxistibûn. Paşe bi hinek haceten bi tîrj û elektrik çaven wî niherîbûn. Li kaxizen ber se rî, bi herfen mezin û xüoxarî, «commotîo amnesî, bine çavan başin, reflex başin, hefteke şûnde niherandineke nû» nivisîn...
We evare diya vvî, li dora xwe dinherî û:
Tu direj kirîbûyî. Li ser cî. Em heviya jîpe bûn. Min ji bave tere got, «Soro nebûya, ye kurik bikuştana. Ez jî pere... Xwede je razîbe.»
Bave te rûye xwe tirş kir û qirçimand. «Wî kûçikî vvede bihele. Her tişt ji bin sere wî derdikeve. Le, ve çare xüasbûna vvan tunene. Ez diya vvî, jina vvî...» got. Meriv qet tiştekî ji bave te fam nake. Ev cine, tene se re me? Ji küre xwere got.
195
-XXXIIŞukriye
nobedar hate bajer, çû qereqole, cem qumandare cendir man. Bihna wî çikyayî, hilke hilka wî bû.
Gundiyan, îro küre axe kuştin.
Ke kuşt, ke?
Hemû gundiyan, giştan. Küre axeyî mezin, hildane nava xwe, bi kevir û daranve kuştin.
Mir an birîndare?
Wexta ez hatim, hela he nemiribû. Le bele ber mirine bû. Ruh dida. Dibe niha can daye.
Lavvo, rast beje, kuro. Cima tu ji cem xwede teyî? Meriye nemirî dikujî tu.
Evv zeviya ciye dibistane, traktora axe evv der ve sibe dajot. We

çaxe l&ristin. Hemû hatine ser. Paşe şofer bi traktoreve revî û xüas bû. Küre axe li vvir bû. Bezyane vvî. Rikefî wî kirin. Bi kevir û daranve. De û bave wî gîhiştine. Birîndar û bi xweveçûyî birine male. Bi deh ciyan birîndare. Eze jîpeke bigrim, eðer nemiribe, em birîndar binine vira. Oumandar bi lez rabû ser piyan. Leve xwe gez dikir. Difikirî. Li peş male, bi wî salen xweve, Maruf vvekî zaran, çito ji vvanre xizmet kiri bû? Gişt hatine bîre. Çavva jî bi hemde xwe bû. Ji bave xwe nermtir bû. Feqîre feqîr. Hatin li wî xistin.

Bi telefone li qaymeqam geriya.

Bege min... Niha nobedare Tendureke hat. Gundiyan ve çare jî, küre axayî mezin birîndar kirine. Na xer. Ne bi gullan. Bi kevr û da ran. Bele ve sibe bûye. Bi gotina vvî, pir giran birîndare. Bele... Bele. Eze haye bidime savcîjî. Difikirim birîndar, zûtire, bigihînime vir. He ke destûre bidî, ez jîpa vve jîbibim. Yekejî, nobedare bibîne. Bele. Be le. Ser seran. Sipas dikim. Ez çevva hatim, eze xebere bidim te, bege min.

Telefon girt. Cbcarek vexist. Paşe tiliya xwe da ser zengil, cendirmek hate hundir.

Ji hevalen xwere beje. Kî heye li santrale? Nobedare santrale, nivîsdar, du kesen dine bira li vir bimînin. Yen duh çûbûn, hela he nehatin ne?

Na xer nehatin, qumandare min.

196

Wisane, bira deh kes hazir bin. Li Tendureke bûyer heye. Bira yek here û şofere qaymeqam bege bibîne. Zû, zû. Xwe giran negre vvi sa. Zû.

Ji dû cendirmanre dîsa qîriya. Nobedare Tendureke jî vve jîpek bidîtiya. Bira wî jî meze bikin. Li ser hev teme daye, nava panzde deqîqade

bira li ser re bin.
Ve çare savvcî geriya. Çi bihîstibû, ji vvîre jî got. Nobedar digot ku küre axe Tendureke birîndare. Heke mirîbû, vve jîp zûtire jere bişanda. Bi hirmet telefon danî cî.
Nişkeve, gundî vvekî babelîskeke berve zeviya ku dihate ajotine çûn, vve çaxe Soro li mal bû. Ciye dest girtina stile qetya bû, evva çedikir. Pere jî awqas zemet kişand, le dîsa jî hela he baş nebûbû ku qîrîn û deng bihîst. Reviya berdere male. Piçek dereng hate zeviye, vve çaxe traktör dûrketibû. Yen li ser pûllbce jî, je dûrdiketin. Cîranen wî bi cî kîkom bûbûn, di nav xwede li yekî dbdstin, didane ber pîhnan. Darek radibû û yek dadiket. Soro bi bîhn çikyayî gihîşte. Yek, vvekî çivvalekî di bin lingen vvande bû. Kevir û pîhn li ser hev le diketin. Soro dît, eva küre axa ye mezin Marûfe. Lezeke sekinî. Bi vî halî, penc deqîqe nedikişand,
vve bikuştana. Gundî nedisekinîn. Pir zehmet bû. Ûsiv axa ku dest avetibû debanca xwe, gundî betir qehirîbûn. Bi mirina wî ledbristin.
Bi xeyzeke giran. Soro digot, «lemexin, lemexin, ez ji vvere di bejim, lemexin...» Herdu çîpen xwe vekiribû, Marufhildabû nave, xwe li ser vvîde xwar kiribû Soro. Evva ji daran diparezand. We çaxe diya vvî, mînanî isterkek ji ezmanan bikeve jer, vvek bombeke ber bi teqandine
hate vvir. Küre xwe hemez kir. «Wax küre min... Le mexin. Wax küre min...» digot û li nav çîpe Soro, küre xwe diparast. Çend kevir û dar li vve jî ketin.
Nişkeve, vvek hevvaneka ba ji ber here, gundî şûnve vekişiyan. Te digot, yen gava dine ne ev bûn. Wan le nexistibûn. Daren deste vvan şist, bedeng, dûrve li Maruf, de û bave wî diniherîn. Diya Maruf tedigîhîşt,

edî lenaxin. Küre xwe li aliye dine zivirand. Ji dev û poze wî xwîn dihat. Rûye wî bi xuliye aliyayî, nedihate naskirine. Şewqe vvîji serî ke tibû. Pore wî bi xwîneve vvekî helîse bûbû. Waye. VVaye. Küre min kuştin. Qet dîn, îman bi vvere tüne? Wax lavve min, digot diya wî û des te xwe bire ruye xwe. Xwe pencerûk dikir, singe xwe dida ber kulman. Soro li ser Marûfde xar bûbû û li hale vviye xirab meze dikir. Ûsiv axa jî hatibû ba vvan. Kefbi dev ketibû. Mînanî kaxizeke sipîçüokîbû. Dest û lingen wî diricifiyan. Li ser piya, li jina xwe niherî, paşe li Soro nihe-
197
rî. Çaven wî vvekî dînan bûn. Di ciye xwede ranedivvestiyan û dilîziyan. Sere wî jî bi vvanre diçû û dihat.
We gûkî rind xwar, de herin. We evv jî kuşt. Bira dile vve rehetbe. Güre sere çiyan, merkujen be dîn û be îman.
Pirsen wî vvekî qamçikî ü meriyan xin. Kesî bersiv nedaye. Sere Ma ruf li ser çoka diya wî bû û bi zehmet bîhn hildida û dida. Sere xwe hevraz kir, li mere xwe niherî. Te digot, vve wî bbcvve. Wekî kereka tûj, li pişika meriya keve.
Mir. Bira bimre. Bira ez jî bimrim. We çaxe çaven te ter dibin.
Ax küre min. We gişta bi tevayî evv kuşt. Hûn, gundiyen wî yen çav sor, dev bi xwîn. We û bave wî tev evv kuştin.
Zare zara vve li sere gund, ale jorîn dihate bihîstine. Dile meriya tîşî tîşî dibû, wexta mirov dibîhîst. Niha, li vvir çend kes tene hebûn. Yek û dudu, şûnve kişiyabûn, çûbûn. Soro berî vvan tegehîşt:
Lehîfeke, cercîmeke bînin. Em wî bibine male, got.
Ev cendekî bi xwîn, vvekî torbekî goşt, di nav lehîfede birine hundi re ode, Soro jî li vvir bû. Dît kes pere xeber nade, gelekî rûsar le me ze dikin, Soro ji ba vvan bedeng, hedî hedî vekişiya û çû.
Birîndar her bîhn hildida û dida, ji dev, poze wîxwîn dipekiya û dikişiya

der dore vvî. Mile wî vvekî darekî şikestî, badibû. Meriyan ku digirt, dihejiya. Bi ava şîrogermî xwîna vvî, birînen vvî, ciyen xulî bi xwîneve zeliqîbûn, şûştin, paqiş kirin. Bîhn hildanen wî gelekî tenik bûn. Meriya bi zehmet dibihîst. Jinan li rû û singen xwe dbdstin. Mer her şaş bûbûn. Ûsiv axa, du balgî dabûn li ser hev û rûniştibû. Sere wî di nava herdu desten vvîde bûn, difikiriya. Gişt jî be çare bûn. Tiştek ji destan nedihptin. Wekî belengazan bûn.

Nobedar Şukrî, mele gund û hinek ji gund, li ode bûn. Xwastin no bedar Şukrî, bi hespekî zûtire bişînine bajer. Xebere bide cendirman. Li hatine jî jîpek bi xwere bihaniya, birîndar pe bibirana bajer. Hale vvî ne baş bû. Ji xwede hevî naye birrîne. Ax hela le, hela le. Awqas meh derbas bûn, hela he römorka paşiya traktöre nesitandibûn. Wekî bihata, niha vve birîndar pe bibirana bajer. Çi hevvcebû, dûr, direj li benda jîpe ravvestana. Him jî baş dibû. Çiqasî zû bigeheje ba doxtir, awqasîbaş dibû. Be namûsan. Pere vve girtibûn, le hela he römork neanîbûn.

Piştî rexistina Şukrî, li ber sere birîndar, qîrîn û girin zemanekî kişand. Dîsa eşa sînge Ûsiv axa dest pekir. Car caran bîhna wî diçikiya û hişe wî diçû. Evv jî direj kirin. Ava sar pe dane vexarine. Hinek jî li ruye wî reşandin. Şofer hat. Traktör anîbû ber derî, xwe sipartibû

198

dîvvare ode, bûyeren îro difikirî. «Heke ku ez nereviyam, devvsa vvî, ni ha eze di vî halîde bûm» got di düe xwede. Paşe ji bo van fikren xwe, fedî kir. Devvsa wî yekî din dimir. Bo veya meriv şa nedibû. Ya rastî, xwe jî nedbcvvast bimre. Çi sûce wî hebû? Digotin zeviyan bajo, wî jî dajot. Bisekine digotin, vve çaxe disekinî. Ji ve zede, çi ji vvîre bû? Her tişt ji bo perçek nan nîn bû cima? Li mile şikestî, sere bi xwîn, ruye ku nedihate naskirine, diniherî. Müe vviye şikestî, ruye vviye birîndar û

nav xwînede mayî dihate ber çavan. Ricifî. «Xwede kiriye ez nînim. Xwede kiriye, ez reviyame û xüas bûme.»
Piştî çend sehetan, hale Maruf nehate guhartine. Baş nedbcvviya. Le nemirjî. Dema li de û bave xwe meze dikir, küre vvan li ber mirine bû. Ne tiştek dibihîst, ne jî çaven xwe vedikir. Yen avvha qet xüas nedibûn. Nihave şîna wî digirtin. Diya wî digiriya û kilamen şîne distra. We dihîşt û yeka din dest pe dikir.
Wax küre min. Küre minî be miraz çûyî. Ax erd sere me bbcvve. Çavva sere te xwar. Mîrat erde Tendureke. Ax, xwazila qet bira ev erda jî nebûya. Ax bira evv desten li te xistin, bişkestana. Jin û zaren vvan li ber dîvvaran pars bikirana. Ax, evv desten li te xistin, bira kotîbûn teketane.
Tilî, peçiyen vvan, poze vvan biketa. Rezîl bibûna. Ax lavve min ax...
Tu kes ji male, pariyek xwarin nekiribû deve xwe. Desten xwe ne dane tiştekî. Mîû çelek nedotîçûne çöle. Karen din jî dest nedayîman. Şofer xwe sipartibû dîvver, difikirî, «tu güne vî lavvikî tüne, çi dike evv bave wî dike. Ji kîsî xwe evve badilhevva here. Pir heyfe.»
Jina Maruf, li cem hemûyan nedigiriya. Le li male, hesren çaven vve, mînanî barane dihatine xare. Li cem vvan, li pe, wexta mere xwe meze dikir, bi leçeqa xweve dev û leven xwe digirt. Zaren vve, peşa vve girtibûn. Ji kesî tiştek nedipirsiyan. Wekî hemû kesan, evv jî digiriyan. Hesren çaven xwe û fýrtbca poze xwe, bi peşa xwe paqiş dikirin. Rojeke bihare û xweş, le jin û mer digirîn û düşevvitîne. Hevva ode vvekî mirine giran bû. Yen li ber sere wî rûniştî, destmal di destde, be rî meşan didan û zanibûn edî evv şûnve naye.
Te digot, ba û bager damiriye. Çilo carna, bagera şeve bi sibere diqede û sahî, nermî, nîvgermî dest pe dike. Niha yen çûne malen xwe,

vvüo bedeng, di hemde xwede, giran giran difýkiriyan. Çavva bûbû ku gihîştibûne ve nuxte? Dest bi şer kiribûn. Cîranen nezî hev, yen meri ven hevin, çend kes dihatine ba hev, yen bûyî û davviya vî karîji hev dipirsiyan.
Gelo vve çilo bibe?
199
Birange min, ev du şalin me sebir kir, me denge xwe birrî. Küre xelqe vvekî qumandare eskeriye, bi plan kar dike. Bere traktoreke bi şirîk anî. Paşe jî çû, xwe yek kirî. Nîve gund ji gund derketin. Dîsa jî tere nekir. Zeviyen me hedî hedî bi xwe ajot. Dît kare wî rast diçe, ve çare dest avete devvsa ciye dibistane.
Ye dine, bedeng û di hale xwede difikirî, bersiv da:
Xwazüa me li küre wî nexista. Dibejin ku ne başe, li ber mirineye. Bi xwedede nemiriya. Heke bimre, sere meye gelekî bieşe. Küre vvî jî ne mîna bave xwe bû. Ya rastî evv jî tejke maraye. Dîsa jîji bave xwe çetire. Bave wî ji xirabiye ter nabe. Gere bav bimra. Heyfa levvik. Cbcara xwe dikişand.
Lo birao, çiqasî zû pe hesiyan? Awqas meriv küre pe hesiya? Te digot, vve deqîqede haya hev kirine. Te çûye, gişt ji malen vvan denristine.
Way li min bavo. Evv çi bû? Evv çilo bû?
Yen îro bûyî dîsa anîn peş çaven xwe. Hinekan digot:
Çi heyf, me traktör ji dest dendst. Çû xilas bû. Küre kere, çiqasî jî bi aqü bûye? Fem kir ku çi vve be serî. Diya min jina minbe, eðer me bigirta, meye bi erdeve bikira yek. We ji küre axe xirabtir bûbûya. Gişt jî tedigîhîştin, pir nakşîne, cenderme vve bihatana gund. Şük riye nobedar bi sivvarî çûbû. Çavva hebe hesp ye axe bû, vve be eman bibezanda, zû bigîhîşta bajer. Paşe ji kîse axe jîp kirekirin ne zehmet

bû. Cendirme vve bihatana gund. Hemûyan rind zanîbûn ev. Çûbûn malen xwe, di nav hevdude qise dikirin. Bere, kesî cendirme nedianî bîra xwe. Yen ku dianî bîra xwe, nedbcvvastin, cîran bitirsin. Te digot, cendirme ne ji bo vvan dihat. Karen ve sibe, vvan nekiriye. Tirsa dilen xwe nîşan nedidan. Bo ve, xeberdan nedianîne dor cendirman. Sehet derbas bûn. Tirsa dilen vvan, edî xwe dida der. Hedî hedî j i lev, dev, çav û rûyen vvan, bîhn hildana vvan, tirs dihate xuyane. Çi qaşî xîret di kirin ku tirsa xwe binbcemînin, hersa vvan her zede dibû. Çi bikirina nedibû edî. Tirsa vvan ji rûyen vvan dihate xwandine.

Soro dereng hate mal. Li ber xwe diket, xemgîn bû. Milen wî ranedibûn. Çavva jî haya wî zû nebûbû. Sitile çavva nehîştibû, zûtire bibîhise? Heke di serîde bigihîşta, nedihîşt tişten avvha bibin. Eðer evv nebûya, küre axe mirîbû. Heke xüasbe, xwede jî zane, vve bi xera Soro bijî. Soro jî çend dar û kevir xwaribû. Pir dilteng bû. Xwazüa wisa nebûya. Ya rastî jî, vvekî bave, güne wî pir tunebû.

Jina Soro, qehr, bencvveketina wî ferq kir. Le tiştek ji dest nedihat. Xwast, çend pirsen dilgermîn beje. Nikaribû. We çaxe Mîro hat. Bi pirçîbû. Mede wî tunebû. Evvî jî vvek Soro, xeter baş didît. Cendirme

200

vve bihatana. Yen zordestî û teda bikirana. Heke birîndar bimre, tu vve çaxe bibîne. Herdu jîji tiştekî ditirsiyan. Ke küre axe kuşt? Le vve kî gundî hevdu negirin û bitirsin. Paşe sûc bavejine hustiyen hev. Eme vve çaxe bişevvitin. Cendirme li ber hatine bûn. Birîndar bimre, kes nikare ji kesîre beje ku te kuşt. Kîçi zane ke kuştiye. Gundekî hemûyan.

We ke bi ceza bikin? Levvra, gerek meriv hemû cîranan hişyar bike. Gundî gişt li vve dere bûn. Le bele kesî nedîtibû ku ke lexistibû. Kevir û dar havetibûn küre axe. Gerek hemûyan wisa xeber bidana. Sere di nava gunda bû. Heke sûc bavejine ser hev, qet yek jî nikaribû, ji bin vî

karî bifilite.
Soro gazî Eliye xwarziye xwe kir. Evva rind ser\vext kir. Di nava nîv sehetede gerek hemûyan ev tişta bibîhîstana.
Herkesi fem dikir, vve li gund tişten mezin bibin. Bedengî hebû.
Eðer li cîkî bedengî hebe, ji vvir bitirse. Davviya bedengiyan tîpî û bagerin. Teqîniye. Levvra di hale vvilode, hers û şik bi hevre dimeşin. Gu hen meriyan her tiştî dibihîsin. Ji her tiştî meriv dikevine şike. Van deman, meriv di dile xwede pir tiştan dihese. Hale merivan, niherandinen çaven kesan, gelek tiştan dibejin. Bele, dineya di hundire kesan û dinya derve bi hevre giredayiye. Nava vvande reyek heye ku em vve nabînin.
Di piçûktiya xwede gelek caran dîtibûn, piştî devvreke bedeng, be bûyer, qîrîn û seren giran, bûyeren kesî hevî nedikir, dihatin. Levv ra kînge halekî avvha bijîn, davviya vve dianîn bîra xwe. Li Tendureke jî, piştî bûyeren ve sibe, ev bedengî, ev kerrbûn nîşan dida ku tişten mezin vve bibin. Di peyre dihatin evv.
Careke duda, çend jinen bi salen vvan zede, çûn mala axe. Li vegerandine hale Maruf ji gundiyanre digotin. Hela he nemirîbû, le bele vvekî bere, li ber mirine bû. Hinekan bi nîvdilî digotin:
Xwede zane, xilasbûna wî tüne. Tobe, tobe. Xwede zane. Qet ne başe. Ne çaven xwe vedike ne jî tiştekî dibîhîse. Kevçîkî ava sar jî nikarin ji gevvriyede daqultînin. Tu cîkî vviye sax tüne, le daye. Serî, çav birîndarin. Mil şikestiye. Her deren wî perçiqîne. Ne bi cane. Wekî mirîkî bi nîvcane.
Ev jinen ku dihatine mala axe, hevalen jina wî bûn. Bere çend ca ran çûn û hatin. Kînge ku vedigeriyan, li male gundiyan dor le digirtin û dipirsiyan.
Kî hene li mala vvan? Bîhna xwe dikare hilde?

Çaven xwe qet nikare veke? Cima qet nabihîse?
Bersiven vvan jî, gelek caran, dibcvveşî nedida kesî.
201
Oumandar bi deh cendirmanve hate peş mala axe, edî nîvro zûve derbas bûbû. Bi du jîpanve hatin, toz û duman li pey xwe radikirin. Esir nezîk bû. Nobedar ku got «küre axe kuştine», qumandar bi rede çend cara şofer hişyar kir, he lez bajo û zûtire bigîhejine gund. Te di got, difîriyan. Ji binya gundve nezî male dibûn, qumandar meze kir, li derve kes tunebûn. Ne ü gund, ne jî li ber dere axe. Wîzanibû, her tim avvha dikin. Pir caran kom dibin, xwîna birînen xwe naşon û dbcvvazin ku bûyeran mezin nişan bidin. An jî vvekî qet tiştek nebûye, qet haya vvan ji kesî tüne. Xwe wisa nişan didin. Kes naye xuyane. Meriv ku ke sî diðere, kes tüne li vvir. Nihajî vvisa. Lexistine, küre axe kuştine. paşe jî xwe vvenda kirine. «Hela hûn ravvestin, ravvestin. Eme ji hevdû bipirsin,
kûçiksanno.» got di dile xwede.
Ji mala axe jin û mer derketin peşiya vvan. Dema çaven vvan, bi qumandar
û cendirman ket, he dizanibûn, xüaskaren vvan hatine. Hejî
denge xwe bilind kirin ku gunehe qumandar her zede bi vvan be. Her betir giriyan. Bere qumandar, paşe cendirme peyabûn. Serçaven vvan di nav tozede bûn. Ye herî davvîn, çav biryen wî ji töze nedihatine xuyane. Oumandar nezîke Ûsiv axa bû.
Ûsiv axa, sere te sax be. Maruf çavvaye? He dijî?
Denge Ûsiv axa ketibû. Kurt, kurt, hema ku dihate bihîstine.
Bele dijî. Le bexere.
Cendirman, vvekî di bin ava sar, nîv veciniqîbûn. Seren vvan li ber vvan, di pey qumandar ketine ode. Ode, carekede tijîbû. Yen gava din,

li ber derî bûn, evv jî hedî hedî hatin hundir. Birîndar li ber dîvvare odeyî raste, li ser doşegeke sor direj kiribûn. Wekî zarekî piçûk bû. Yen evv nasdikirin, bavver nedikirin ku ev bedena ya Marûfe.
Doşeg hemû di xwînede bû. Lihefa li ser jî wisa bû. Leçegeke spî avetibûne ser sere vvî. Nîve pirî di xwîna sorde mabû. Hine cî zûha bû bûn, le ji hine deran jî xwîne kem kem dilop dikir. Oumandar bi ser de xar bû, bîhna Maruf gelekî tenik bû. Bere gelek caran dîtibû ku doxtir li damaren zenda merivan diniherin. Wî jî wisa kir. Li seheta xwe niherî, xwast bijmere. Le bele nikaribû damaran bibîne. Careke duda dîsa bi tiliyen xwe teselî kir. Damaren wî vvekî takî zirav, meriya bi zehmet ferq dikir. Oumandar rabû ser xwe, çav ü biriyen wî tirş û bi hers, eniya vvîde dilopen xwiye hebûn. Berî peyivandina xwe, leven xwe gez kir. Ji Ûsiv axa re:
Küre xwe hilde. Kare meye direj bikişîne. Heviya me nemîne.
Zûtire bibe bajer. Li bajer vve çi bikin? Qet... Le bele kare hukumateye, bira haya doxtire hukumate jî bibe. Evv jî gelekî naxwaze vve li vvir
202
bide ravvestandine. We vve bigihîne vvîlayete. Bi xwastina xwede vve xilas
bibe. Bira li vir nava dest û piyande nece, got.
Berya Ûsiv axa, vegerî û ban kir:
De... Tivdareke jîpeke bikin. Nivîneke tede raxin. Pere bira jinek jî here. De zû. De zû. Tu jî, tu jî pere, Ûsiv axa.
Ser van gotinan jina Ûsiv axa him digiriya, him jî tivdareka xwe di kir. Nav çend deqîqande her tişt hatibû cîh. Birîndar kirine jîpe, sere vvî di hemeza diya vvîde, Ûsiv axa jî ü ba şofer bû. Oumandar dere jî pe vekir:
Axa, tu, yen li küre te xistin, nas dikî?

Çi yek, çi dudu. Gund hemû. Evvanen benamûs, gişt bi hevre bûn. Gişt, gişt. Hemû. Bi jin û zaren xweve, qumandar.
Birîndar şandin. Niha nobedar Şukrî, xulam, Hesen, Eso û biraziye axe hebûn di odede. Bîhna xwîne ji her dere dihat. Merivan ku li ruye qumandar diniherî, ji çaven vvî, niyeten wî baş fem dikir. Dbcvvast gundiyan bîne re, heyfa Maruf ji vvan bistîne. Mînanî dijminan bû. Cendirmen li cemjîje ditirsiyan ku le meze bikin. Çaven xwe direvandin, nedbcvvastin li ruye qumandar biniherin.
Hela he pir wext hebû, roj here ava. Rojen biharan, havînan direj bûn. Oumandar li ser kevirekî rûniştîbû û be hizûr bû. Cendirme jî li ber, li benda gotinen wî bûn. Germa nîvroya havîne ku merivan diqelîne çûbû, niha henikayîke şirîn hebû. Henikaya esran. Tendûrek be deng, kerre, le bele guh beliqandiye.
Oumandar he zanibû ku dine li ser vvîde hurşiyaye û evv di binde maye. Oumandar xwe di tengasiyede didît. Birîndar li hemeza diya xwede li ber mirine dîtin, he jî dile wî teng kiribû. Mînanî revvîkî bû. Li pist xwe nediniherî. Lez dikir. Dbcvvast, riya xwe biqedîne. Re di se re çiyan, di nevvalande, vvekî maran dûr, direj dibû. Re bi çûyine xilas dibû. Wî jî dbcvvast, dest bi kare xwe bike. Ya rastî çiye, eşkere bike. Dibe ku paşe, hevvekî sivikbûn dihate bedena vvî. Niha piçek şaşbûn li ser hebû. Ji ku û çavva dest pe bikira? Gelo ke dikaribû alî wî bikira? Digotin, gundekî hemûyan lexistiye. Qet yen ku lenexistibûn, tunebûn gelo? We bi gundekîre, ve evare çilo bikira? Ya rastî, ji ke hîn bibûya? Ûsiv axa çû. Maruf nikaribû bipeyive. Yen ji pare mayî, tiştek ji dest nayen. Wekî ne be xeberbûna, nedüûştin Maruf di nav dest û piyada be kuştine. Ji vanen tirsonek, qet tu gû jî dernediket. Bi hers, rûtirş li dora xwe diniherî. Şofere traktöre li ber çaven wî ket. Yekî beteşe û terrikî bû.

Tu rind xilas bûyî. Te baş kiriye ku tu reviyayî. Kesî nikaribû te
ji desten vvan dence.
Şofer sor bû. He zanibû ku şerma wî dane rûye vvî. Sere xwe xar kir.
Paşe dîsa li qumandar niherî.
Bele vver bû. Min dît ku gelekin. Hemû berve min tene. Min jî
zûtire ajot, çûm, got şofer bi şermoke.
Oumandar leven xwe dadikot û hişe xwede çend plan çedikirin.
Te rind kiriye. Ya rind te kiriye, got jere.
Nobedar Şukrî bi vvanre vegeriyabû. Çoke vvî, paşiya şale wî pîne
kirîbûn. Wekî eskeran evv jî hazir disekinî. Texmîn dikir, qaseke şûn
ve, gelek kar vve bi para wî bikeve. Levvra çaven xwe ji qumandar nediqetand.
Pismamekî Ûsiv axa, li bajer, dema ku bûyer hîn bûbû, hesp
ji nobedar sitandibû. Evv jîbi cendirmanre vegeriyabû, bi jîpe. Niha ji
herdu çaven qumandar, hers û qehreka wisa dihate xuyane ku evv bagera
gundiyan ya ve sibe, li cem nedihate xeberdane. Wisa nesitirîbû
ku te digot her tişt vve be sere wî bi xwe. Wekî kuviyan bi tirs bû. Ji qîrandine,
qelebalixe, bûyeren vvüo hez nedikir. Dile wî reş û tarî dibû.
Xwe şaş dikir, nedifikirî. Peşiya xwe nedidît vve çaxe. Piştî qedereke
diricifî, hedî hedî hînî vî halî dibû. Tirsa wî dilop bi dilop vvinda dibû
û xwe jî nezîkî bûyeran dibû.
Oumandar rabû ser piya. Deste xwe direjî herdu eskeren peş xwe
kir.
Tu û tu.
Eskeran xwe berhev kirin û gavek peşde hatin. Desten vvan li ser tivingen
mile vvande, hazir ravvestiyabûn. Li çaven qumandar diniherîn.

Oumandar paşe, li aliye Şükriye nobedar zivirî:
Tu jî nobedar, tu jî, got.
Oumandar ku rabû ser xwe, nobedar hat li ba herdu cendirman cî girt. Biriyen qumandar quloz dibûn û dihatine xare. Di hişe xwede hi ne tişt hildidan û datanîn. Eniya wî dileyzt.
Hûne tev herin. Nobedar, te gazî meren hemû malan bikî. Bira bene vira. Yen ji heyjde salî mezintirin. Yen ku nayen, hûne bi zore bînin. Desten xwe sivik bigrin. Wisa xwe nehejînin, vvekî zaren efendiyan. Biniherin, paşe hûn zanin ha. Pir hişyarbin ha.
Oumandar evvanan şandin, xwe li peş derî diçû û dihat. Dilteng bû. Kerr û bedeng disekinî û hersa wî her zede dibû. Paşe zivirî, evv heyşt cendirmen mayî meze kir. Xulam diçûn, dihatin. Jin û zar, pey çûyina birîndar, ketibûne male.
204
Hûne sungiyen xwe pevekin. Yen hatî bi rez li ber dîvver bidine sekinandine. Eze ji hundir yek, yek ji vve bbcvvazim û hûne binine ode. Eme ji nav vvan, ye kü bûyer kirine û re bere vvanin, bibine bajer. Ge re em dereng neminin.
Renge wî çilmisî, denge wî bi lerzok bû. Dbcvvest ku gundiyan di tariyede bibe bajer û kes vvana nebine. Awqas kesan, bi qelebalix, ronahiya rojede texe qereqole. Qet tiştekî baş nîn bû. Bele vana küre axe kuştibûn, le dîsa jî baş nedigotin. Wana, Maruf birîndar kiribûn, vve kî miriyan. Gunehkar bûn. Dîsa jî awqas kesan, di nav sungiyan, di nav bajer derbas bike, bibe û texe qereqole. Wisa nabe. Hinekjixelqe ba jer, di kuça û qehwan dest bi xeberdane dikin. Levvra xwest wexte rind hesavv bike. Gevvrî û leven wî zuhabûn. Ji yen cem xwe av xwest. Lezeke şunde, jere avdevv anîn. Bi ser hev du şerbik vexwar, paşe eske ran jî dûmî hev kirin. Xulame avdevv anîbû diçû hundir. Oumandar

evv zivirand, avdevvâ mayîjîbi ser xweve kir. We çaxe gundiyen ku he dî hedîji hav gund dihatin, dît. Lingen vvana nedbcvvestin ku peşde be ne. Bi xwe sere xwe dihatin. Seren vvan di berde bûn. Ji cendermekîre:
. Here wî yalî, li vve dere binihere. Gazî vvana bike. Bira zû ben, got.
Cendirme berve gundiyan çû, vvana jî gaven xwe sivik kirin. Xwe dispartine hevdu û dihatin. Nezî qumandar dibûn, te digot ku lingen vvan ji erde ranedibû.
-; Nezîk vverin. Nezîk vverin. Oumandar qehirî û paşe vegeriya li aliye cendirman.
Min ji vvere çi gotibû, ere? Hûn çi vvekî gejan rûye vvan diniherin?
Cendirme peşîn, vvekî sûce xwe bide bîrkirine:
Li vira. Li vira. Li ber dîvver rezbin. De zû, de zû.
Şewqen xwe dabûne desten x\ve. Xeber nedidan. Nîv diricifiyan.
Pişta xwe dane dîvver û sipartine hev. Li pey vvan jî he dihatin. Van dît ku berya vvana gelek hatine, tirsa xwe vedişartin û nezî reze dibûn. Di bin çavande li hev diniherîn. Ji ruyen qumandar û cendirman, dbcvvestin ku tiştna fem bikin. Oumandar niha be deng û kerr bû. Yen nûhatî meze dikir. Bi leven xwe düeyst û gez dikir. Oelebalbc her diçû ze de dibû. Hinek vvekî gunehkaran dihatin, kerr û lal diketine tevî reze. Wekî şagirten ku sûcen xwe zanibin. Hinek, çaven qumandar û cen dirman digeriyan ku li ber xarbin. Li evv jî nedibû. Yek ji cendirman ji vvame got, bi se hevv se hevv tekevine reze. Mînanî eskeriye. Bedeng, 205
di nav hevde bi piste pist dipeyîvîn. Yen rez şaş dikirin jî hebûn. Yen nû dihatin, bi hesanî ba cîranen xwe cî digirtin. Davviyede nobedar, herdu cendirman, çar gundî li peşiya vvan hatin, Gundî tevî reze bûn. Cendirman paniyen xwe li hevdû xistin û silav dane qumandar.

Hemû hatin qumandare min.
Kes nema ne?
Na xer. Kes nema, bege min.
Soro di navîna rezede, ü cem Mîro û Seîdbû. Pişta xwe daye dîvver. Pişta wî dieşe. Piştî bûyeren ve sibe, sereşeke pç girtiye. Sere wî diziqitiya. Pişta wî bi çokanve dieşiyan. Desten wî diricifîyan. Bekef bû.
Mihe kalemer, xwe dabû ser qulofîskan. Nikaribû li ser piyan biseki ne. Oumandarjere denge xwe nekir, cendirmanjîli şer nesekinîh. Ev do li peş vvî, li ser piyan bû. Ji tursan müen wî daketibûne jere, le bû li erdekeve. Bi dizi dizî li dora xwe diniherî. Kesî U wî meze nedikir. Bersiv nedidan. Hişe wî hünedida. Gundiyan wisa zede rûnedidane. Di gotin ku merive axeye. Xwe jî niha di nava sungiyande bû. Bi meraq, bendevvarbû.
Soro bi xwarziye xweve xeber şandibû hemûyan. Gelo gişta bîhîstiye? Dibe ku bejin, «ez nîn bûm, hineken dine bûn». Oumandar li peş vvana diçe û te. Li ruye kesînanihere. Ji dûrve jin, zaren vvan meze di kin. Çavtirsîne. Mala Ûsiv axa jî meraq dikin, gelo ye çi bibe? Birîn dare çûyî bîr kirine. Ji gundiyen xwe gelekî diqehiriyan.Qet ji xwede netirsiyabûn, hetanî mirine li Marufxistibûn? Maruf çi li vvana kiribû? Gundîtu cara jî, nedihatine re. Du şalin ji derd ü belan xüas nedibûn. Yek diçû û yek dihat.
Oumandar bi cendirmekîve çûne oda Ûsiv axa. Li ode kes tunebû. Xulaman her der paqiş kiribûn. Şofer, dervali ser motore, çend ha cete vve teselî dikir. Oumandar U ser piyan bû,ji cendirmanre got: Ji serîde dest p6 bike û bîne. Gunehkaren rastî kîne, gere ez vva na bibînim. De bîne. Evve, herî sfirî bîne. -
Cendirme, li peşiye, yekî pencî salive kete hundir. Rûye wî qemitî, poz xüoxarî bû. Xwe şûnve ma, bi deste xwe gundî peşda dehfand bi

nermik. Hestiyen gundî mezin, rûye wî gelekî bi pirç bûn. Peşde çû. Şewqe di deste çepe, minanî eskeran sekinî. Oumandar li peş wî bû. Li rûye qumandar na, le li sînge wî diniherî. Oumandar nedbcvvast xwe bi hers nîşan bide. Nermayî da denge xwe Nava vvande niha du me tro hebûn.

Nave te çiye?

206

Gundî sere xwe bilind kir. Li çaven hev niherîn. Rûye qumandar qet hez nekir. Tahir.

De beje Tahir. Ke li küre Ûsiv axa xist? Ya rastî beje... Tu ku nebejî, tu zanî, di davviyede çi dibe? Ne vvisane?

Bele bege min, ez zanim.

De vvakî vvisane, bi aqü, ya rastî beje.

Gundî hemû hebûn. Gişt jî li vvedere bûn. Kî hebû, kî tunebû, niha nikarim yek û yek bejim. Hema gişt jî hebûn.

Oumandar hela he nerm bû. Dbcvvast ku wisa here.

Binhere, bira gotinen te bene ber guhe te jî. Çilo, gişt li vvederebin û tu jî nizanibî, kî hebû, kî tunebû? Zarok jî ve nabejin.

Bele gundî hemû hebûn. Hinekan kevir diavetine traktöre. Hi nekanjî diavetine Maruf. Ke lexist û ke lenexist, nizanim. Gelekan ke vir û dar diavetin.

Tu jî li vvedere bûyî?

Bele, ez jî li vvir bûm.

Nişkeva qumandar nermiya xwe vvinda kir. Çaven wî vvekî brûske bûn û ciyen xwede ranedivvastiyan.

Kuro, çavva ferq nakî tu? Ere? Rast beje.

Rast dibejim. Welle, bille rast dibejim.

Kere küre kera. Cima hemû gundekî bi hevre lexist? Yen ku bi

kuştina wî lexistin, kîne? Wana beje.
Nizanim, hemû hebûn.
Oumandar edî nikaribû li heviya davviya gotinen gundî bisekine. Ni şkeve pîhnek li çoke Tahir xist. Yek, yek dîsa. Dîsa, dîsa. Hestiye çoke, vvisa dieşiya, te digot ku şikestiye.
Way daye.
Kulm û sîlle, vvekî barane dihatine li dev, leven Tahir. Rû û çaven vvî bi kulman reş heşin bûn. Li erde ket. Rabû. Xwast, bi desten xwe rûye xwe bipareze. Pîhnek xwar û li ser qûne dîsa li erde ket. Sere vvî ku li erde ket, îsterk li ber çaven wî dipeqiyan. Oumandar qet cîkî vvî nedianîber çaven xwe, bi pîhnan ledbdst. Cendirme tirsiya. Kîjan pîhn, kulm li Tahir diket, cendirme behemdî xwe, rûye xwe diqirçimand. Ji dev û poze wî xwîn dihat. Tahir he zanibû ku çenga wî şikest, anjî ji cî derket. Tûyî kefa deste xwe kir, du diranen wî yen şikestî, bi tevî xwîne ketine deste vvî. Oumandar betir hers bû. Diricifiya. Çavva û li kedera vvî dbdst, xwe jî nizanibû. Deste xwe avete pesîra gundî û bilind kir. Kişande quncike ode, kulmeka zexm li çavan xist.
Niha, li vedere bisekine.
207
Oumandar vvekî dînan bû. Çaven wî ji cî derdiketin. Dora deve vvî kef bû. Gundiye feqîr di wî quncikîde telya û dinaliya. Oumandar li desten xwe diniherî. Sor bûbûn. Zenden wî dieşiyan. Çend caran, zenden xwe virde, vvede livand. Tiştek nîn bûn. Ji cendirmere got, bira ga zî xulamekî û birazye Ûsiv axa bike.
Xulam hate hundir. Oumandr çend daren qalind û zexm je xwastin. Gundiye duemîn xwaste hundir. Cendirme evv anî. Di nezîkayede rûye xwe kur kiribû. Nezîkî kina, rûye vvîgüover, hinekî hupizî, poznikil û vvekî rûviyan h dora xwe diniherî. Gaven xwe bi teql diavetin. Za

nibû, ji bo tiştekî baş nehatiye vir. Levvra, di düe xwede bi tivdarek bû. Wisa dihate xuyane, ji bo her tiştî xwe hazir kiribû.
Oumandar, çîpen xwe hinekîji hev dûr xistî disekinî. Le bû, vve nûhatî, saxî saxî bbcvve. Gavek peşde çû, nezîkî wî bû.
Nave te çiye?
Osman.
Ke lexist? Ke Maruf axa kire hale miriya?
Li ber çaven qumandar ha li Ûsiv axa xistine, ha li küre vvî. Herd jî yekin. Levvra wisa dipirsiya.
Min nedît ke lexist. Gundî hemû li vvir bûn.
Çilo te nedît? Ke bere peşiye lexist? Ke kire vî halî? Ke mile vvî şikenand? Qe hemûya bi hevre mile wî neşikenandin? Ji bin sere ke derket ev kara? Kî bûn? Qey gund bi tevayî ne gunehkare. Yen ku ki rine, çend kesen tolazin, ne vvisane? Tu niha nave vvan ji minre beje. Ez nizanim bege min. Gundî bi tevayî le bû.
Lavvo, wisa dîn dîn nepeyive. Tu jî, li vvir bûyî?
Bele, ez jî li vvir bûm. Hemû li vvir bûn.
Wisane, rebere vvan, tuyî?
Rebere çi? Ez kesî vvüo nizanim. Gişt jî hebûn. Ez ve zanim.
Gundiye peşîn, di quncike xwede, ye nû guhdarî kir, eşa bedena vvî nemabû. Dilgeşî hate cane vvî. Cîranî wî Osman jî mîna wî dipeyiviya. Çaven vvî, bi dibcvveşiye dibiriqiyan. Dbcvvast çaven Osman bibîne, le pişta wî pere bû.
Ve deme, xulam bi çar daranve hate hundir. Ne çar dar, çar mer tek bûn di hemeza vvîde. Li feza ode danî. Kerre kerr, dîsa derket û çû. Evi kinî, hupizî, qumandar he zede dîn kiribû. Xwe da ser lingekî, vvekî kevaneke teviya û kulmek avete gundî. Li hustiye wî ket. Teisî, le, nekete erde. Ne kulm bû, te digot gülle bû. Li van deran hemû kes,

li ber kulmen wî tamîş nedibûn. Hela feqîre gundî fem nekir ku çibû, bi desten dine yek jî da ser çaven vvî. Peş çaven Osman reş bûn, hişe
208
vvî çû. Li erde ket. Tahir li piş vvî, hal perişan bû. Le bele bi çaven bîr û bavver li Osman diniherî. Osman ferq kir. We çaxe Osman xwe her şidyayî girt û xurt bû. Sîlle û pîhn bi tevîhev bûn. Be hesab bûn. Te di got ku bi terekede kartol havetine nave, hemû bi pîhnan ledbrin. Bi va na ter nebû qumandar. Darekî mezin hüda deste xwe. Çav û serî nedigot, ledbdst. Paşe yek, yek dîsa...
Rû û seren vvan, dest û piyen vvan di nava xwînede, ode her diçû, tijî meriv dibû. Nîve cendirman li peş vvan bûn. Paşe çar cendirmen bi sungî, even ku hatine kutane, li hevvşe rez kirin. Geleken vvan, nikari bûn li ser lingan bisekinin. Xwe sipartibûne hev, pişta xwe didane dî vver. Çend kes li hember derketibûn, kiribûne zarinî. Oumandar, evv peşde dendstin û careka din jî, da ber kulm û pîhnan. Di ber xwede. bi dengekî nizm de û jina qumandarre didane xeberan. Oumandar pir vvestiyabû. Te digot, pîhn, kulm û bi awqas daran li wî xistine. Dihejiya. Le bû ji xweve here. Dile wî diricifiya. Firniken poze wî vedibûn, leven wî düeriziyan. Milen wî mînanî kulavan, tiştek nedigirtin. Levv ra, yen ku nû dianîn, nikaribû bi dile xwe, bide ber kulman. Waxta bi dile xwe li gundiyan nedbdst, her diçû hersa wî zede dibû. Betir diri cifiya. Xale Mihe, li peş vvî, nîv kelogirî bû. Bi van salen xwene zede, be kutane... Pirsen ne baş bihîstin, jere gelek giran dihat. Levvra, le bû bigrî. Oumandar devvsa küre wî bû. Dar di deste qumandar, çaven vvî bi hers, ji qehrana bedena wî diricifiya. Mihe qumandar wisa dît. Der de wî ne eşa daran bû, le ev kara pir giran le dihat.
Ke lexist? Ke dest pe kir? Kesen reber hene elbet. Beje. Tu kalî. Derevvîn ji tere eybe.

Heşa bege min. Ez rast dibejim. Bi van salen xwe...
We hela he bigota.
Berde, berde vana. Tu niha bersiven min bide.
Ez çi bejim? Buxtanan bavejime ke, bege min? Hemû jî hebûn.
Ez veya zanim. Gişta jî evv birîndar kirin. Ya rastî eve.
Hela he davviya peyiva xwe nehanîbû pîhnek xwar. Li erde ket. Ni karibû rabe ser xwe. Wisa ma li erde. Oumandarjorve le diniherî. Evvî çîpen xwe kişandibûne ber zike xwe, çaven wî li rûye qumandar û vvi sa li erde direj, disekinî. Ji ber vî halî, qumandar pir dilteng bû. Ji kirina xwe şerm dikir. Kale edî le nedinherî. Dbcvvast rabe ser xwe. Di giriya. Him jî bi deng, bi küre kûr digiriya. Yen peşî li hevvşe bûn, levvra kesî evv nedidît niha. Oumandar ku dît evv digirî, he jî tevîhev bû. Bi hers dar avete erde. Ji cendirmanre:
Eze qaseke şûnde beme, got û derket.
209
Derket û çû. Di pist malere, berve ava piçûk meşiya. Cbcare di kişand. Tiliyen wî vvekî kaxizen li ber ba, dihejiyan. Deve wî mînanîje re bû. Li ber ave bîhneka kûr ji cbcare kişande hundire xwe. Dest û serçaven xwe bi ava sar şûşt. Pesîra kirase xwe vekir. Ava sar ü sînge xwe reşand. Hedî hedî zivirî male. Li ser xaniyan, li ber dîvvaran jin û zar dîtin. Desten vvan li paşüan, anjî li ber rûyen vvan, nedüipitiyan. Wüo bi çaven sar li wî meze dikirin. Hinekî din jî nezîk bû. Di vvan ça ven ku li wî diniherîn, dijminayî, düşikestî û qehr dihate xuyane. Wekî tiran, dile qumandar dieşandin. Li seheta xwe meze kir, tegihîşt ku dereng maye. Lexistina gundiyan, sehet û nîvek kişandibû. Çavva jî qet ferq nekiribû. Hate ber derî. Niherî, awqas pir gundî, ji pare nemabûn. Mîrojî para xwe hildabû, le qasî yen dine nînbû. Li pey wî Soro anî bûn.

Lo, çûrî heramo. Tu dîsa li peş minî? Cima tu nabî meriv? Be heyayo. Çend çeren vvüo li pey hev rez kir qumandar. Paşe:
Ke birîndar kir, ere? Beje ke dest pe kir? Ke peşiye lexist? Kiye şeytane vve? Eðer tu ji min dipirsî, haya te ji vvan gişta heye. Ji te baştir jî şeytan nabe. Ez çûme li reberan diðerim, te betir reber heye tu?
Na xer bege min. Na xer. Ez esse dibejim, na xer. Min li mal kar dikir, denge qelebalixe bihîst. Min dît ku hemû gundî berve zeviya, ci ye dibistane direvin. Ez jî pare revîm û gihîştime vvan.
Cima çûyî? Cima tu neçûbiyayî nedibû? Yekîji tere got here?
Na xer. Ji bo çi? Qet kesîjî negot. Xelq gişt diçû, ez jî çûm. Gun diyan gişta kevir dihavetine. Birîndar kirin. Em gişt li vve dere bûn. Ke lexist, nizanim. Ye birîndar, bi xwe jî nizane.
Helbet nizane. Kuçike heram. We tu merikve, hale yekî ku biza nibe hiştiye... We dine li ser wî hurşandiye. Wekî miriya bû. Dibe ni ha, zûve jî miriye. Te rastî bejî an na?
Rast dibejim. Cima bavver nakî?
Hetanî vve çaxe qumandar nermîn bû, le her diçû vvekî bere har di bû. Nişkeve xar bû, ji erde darek hilda. Bilind kir ku lexe.
Li min nexe. Bege min. Li min nexe. r
Van pirsan qumandar şaş û metel kirin. Di ciye xwede ma. Wekî kevirekî. Paşe hejiya bi ser lingan.
îca, tu dibejî li min nexe, ne? Li min nexe.
Bi xezew çû ser Soro. Rikefî wî kir. Bi dare qalind, li milan, navmilan û her deran xist. Serî û çav nediparast. Soro xwe da alîkî, nişkeve. Oumandar vvekî gurekî ku neçîra wî ji dest fîlitiye. Mîna pisîkekî, li dû
210
mişka ketiye. Soro, dare ku qumandar pe ledbdst, girt. Sere şiva vvekî mertega, di deste Sorode bû niha. Yale dine ji dest qumandar füitî.

Tüyen wî şist bûn, nedişidand qasî Soro. Soro li peş qumandar bû, li pîşt wî jî du cendirme hebûn ana. Bi sungî bûn. Cendirme qet ji ciyen xwe nelipitîn. Li vvan meze kirin. Cendirmajînizanibûn, ku vve çüo bi kin. Oumandar tu tişt ji vvanre negotibû. Levvra, wisa benda wî man. Soro bi kîn li qumandar niherî, paşe şiv havîte erde. Xar bû şewqe xwe ji erde hilda. Denge qumandar vvekî brûske bilind bû.
Ev çiye, ez ji desten vve dikşînim? Hûn bûne bela sere min. Wekî naxireke heyvvanan. Biteyise, magî heramo.
Eskeren bi sungî, desten xwe dane ser mile Soro, evv şûnve kişan din. Soro, pirsek ji dev derneket, çaven wî mînanî agir dibiriqiyan. Yekî vve çaxe Evdo anî hundir. Evdo wisa çilmisî û hûr bûbû, te di got, vve tekeve nava qalike findeqa. Renge wî sipîçüokî. Pir ditirsiya. Bi vî halî, gunehe meriya pe dihat.
Ev karen avvha, ke kir?
Nizanim.
Li ber xwe niherî, paşe kire bilde bild.
Welle nizanim, got.
Meriya ku yek lexista, vve bi ciye xwede biketa erde. Nîve kulme jî dibe, vala biçûya. Ye peşiya vvî, çiqasî bi ser xwe bû, xwe nedida perçiqandine...
Levvra qumandar xûlîbûbû. Le bele dile xwede ewe peşîn pîroz dikir. Wekîgurân le diniherî. Ne şist bû. «Le eva? Te digot, hun dire küre kere qetyaye» digot qumandar, di ber xwede.
Tu jî hebûyî li nav yen ku ledbdstin?
Nikaribû bersîve bide. Fikirî. Zanîbû, gundiyan çilo bersîvdane. Li gund bihîstibû. Di rezede, li cem gundiyen xwe, ji yen hatibûne kutaridine hîn bûbû. Hemûyan jî rind fem dikirin, vve qumandar betir diqehirîne, gundî bi mînanî hev xeber didan, vvekî hev dipeyîvîn. Gelo evvî

jî dikaribû vvekî vvan bike? Zimane vvî, devde venegeriya. Kire bilde bild.
Bege min... Ez. Ez. Nîn bûm. Na xer, ez li vvira nîn bûm. Hezdikî ji Ûsiv axa bipirse.
Kuro, kûçike heram. Ûsiv axa, vve sehete çavva bizanibe ku tu ne li vvir bûyî.
Oumandar diqîriya. Evdo bi dengekî nizm, bi zehmet dihate bîhistine, pirsen xwenen bere dîsa duçar kir.
Heke bavver nakî, ji Ûsiv axa bipirse. Evv zane.
211
Oumandar pevvîst nedît lexe. Le bele pîhnek tene havete qorike. Çend kes dîsa hildane hundir. Hinek bi kulman, hinek bi daran, dev leven vvan di xwînede, çûn rezede ciye xwe girtin. Di nav birînande bûn. Halen çendekan ji yen din baştir bûn. Li ber derî, ser qulofîskan rûniştibûn. «Eðer bi awqasîbifilitin, başe» digotin di nav xwede. Cen dirmen bi sungî li dora vvan bûn.
Geleke vvan ditirsiyan ku eðer birîndar bimre, vve çi bibûya? Bele, hela ka Maruf bimre, wisa erzan xüas nedibûn.
Du daren mezin bi lexistine şikestin. Ke îna dikir ku ev dar bilexistina merivan, avvha tiş tîşî bûne. Yen ku zare zar kiribûn, giriyabûn, ji yek û duda zedetir nîn bûn. Gelo, vvüo kerr û lal, awqas zorbetî, lexistin cima qebûl dikirin? Bi birîndariya küre axe, gunehe hemûyan he bû. Yen ku gunehkarin, gere davviye jî qebûl bikin. Wisa difikiriyan. Yeke jî, di van du salande, guhartinek çebû di nav vvande. Hedî hedî bûbû. Kesî ferq nedikir, çilo û kînge guhirîn evv. Ji bo zeviyen xwe, du salan zorbetî, birçîbûn û belengazî dîtibûn. Tevayî li hember sekinîbûn. Girî û zare zarbûn edî ne peşe vvan bû. Gelek ji vvan te digihîştin ku bi girî û lavakirin nabe. Gere ner tiştî bidine ber çaven xwe, devva

erde xwe bikin. Ev guhertina tiştekî rast bû niha. Le vvan bi xwe tiştek ferq nedikirin. Ve guhartine quwet û sebr dida vvan. Levvra deng ne dikirin, her tişt qebûl dikirin. Jin, zar û meren vvan, edî baş zanibûn ku be derd, be eşandin meriv xweyî erd nabe. «Keremkin ev zeviyen vvene» nabeje kes ji kesîre. Ketin û rabûn. Sere xwe bide şikandine û sere kesan bişkîne. Bere, ji veya pir ditirsiyan. Tiştekî piçûk jî hundi re vvan diqetand. Niha, hatine guhartine û avvha bûne.

Nav du salande, kem kar di günde vvande nebûn. Yen ku malen xwe hîştin, çûn. Bere dizi, dizî li hemberî axe derketin, paşe eşkere bû. Wekîbere,

edî kes neditirsiya. Giştan jîheq didan van karan. Bi tehrekî din nedibû.

Ev hefteke li hemû malan dihate xeberdane. «Em ji zeviyan kem hildidin. Zede nayen. îsal qet kulmeke jî nadine Ûsiv axa. Me got ku em dîsa vvekî bere, bi hevre derbasiye bikin. Levvra ji van zeviyen nûvekirî

para wî didin. Evv, jiyane jîji mere zede dibîne. Ev zeviyen nû ku dane me, me nûrakirin, cima tu erde bave vvîne? Cima em kerin, hela he bidine vviya? Evv erde kene? îsal qet libek genim jîjere tüne», digotin.

Ji bo vî qerarî, gundî neciviyabûn û nepeyîvîbûn. Le wisa dihate xuyane ku îsal tiştek nedidane axe. Traktora axe, ajotina zeviyen vvan...

212

Bere ev qerara di hişe xwede, paşe di malen xwede dan. Gundî hemû vvisa difikirîn.

Axa bi xwe jî di şikede bû. Tirs ketibû dile vvî. Tirsana ev kara nedipirsiya, hünedida û danedida. Nedbcvvest ku tev bide. Paşe jî ev bûyera bû.

Hale gelekan ne baş bû. Mile hinekan vverimîbû, ji ber eşan, nika ribûn bilind bikin. Çenga Tahir reş bûbû, du dirane vvîşikestibûn. Yen ku sere vvan şikestibûn, penc, şeş zilam bûn. Xwîn ji rû û hustiyen vvanve hatibû xare. Xwîna zuha dibiriqiya. Gelekji vvan hela he xwîn le zuha nebûbûn. Ji vvan destmalen du kesan tene hebûn. Yen dine bi davva kirasen xwe xwîna xwe dimaltin, birînen xwe dipeçandin. Devvsa pîhn û tizikan reş bûbûn. Ji ber eşan, nikaribûn ser piyan bisekinin. Ber çaven gelekan, ji kundikan vverimîbûn.

Mala axe, vvekî ciye ku tu le pez şerjekî, di xwînede mabû. Bere, ge le mala axe jî, bi rû tirş li van kesen ço xwar meze dikirin. Di pere, he dî hedî dile vvan jî, ji van kesan dest bi şevvate kir. Li ser ve lexistine, birîndare xwe jî bîra kiribûn. Gişta jî baş zanibû ku Soro nebûya, tu kesî miriye Marufjî ji vvan xilas nedikir. Evv jî gelekî hatibû kutandin. Wan jî fem dikirin ku di pey ve tadaye edî gundîjî, vvan rehet bernadin. Dibe ku gele tişten he mezin bene sere vvan.

Axaye günden nezî vvan, Zubed û Cemal, piştî nîvro hatibûn mala Ûsiv axa. Evv hîn bûn ku Ûsiv axa Maruf hildaye çûye bajer û cendir me qumandarî jî dest daye ser bûyere. Silav dane qumandar. Xatire xwe xwestin û vegeriyane malen xwe.

Roj diçû ava. Niha evareke bihareye xweş, Tendûrek di nav tajanekede hîşt û çû. Tîrja roye ji dûrve xuya dibû, bîsteke şûnde evven vvin da bibiyan. Golikvane gund, gava ku hate li pere gund, xenji çend zaroken rûpirçî pevatir tu kes nedît. Gavane gund jî li pist golikvan ke tibû gund. Jinen gund guh nedidan borina çelekan û dumana li pey naxire. Bi dil sarî dest dihavetin leme çelekan û dest bi doşane diki rin. Zarokan ve evare, mînanî her tim bi lotik û xweşiye bi divvela heyvvana

nedigirt, nedüeystin. Jinen gund li ser giryen bûn. Gundiyan he

mû zanibûn ku zilamen vvan, li mala Ûsiv axa hatibûn hincirandine.
Xort û kal ji hev nehatibûn bijartine, bo lexistine. Çend jine gund, demeke,
dbcvvestin bigotana ku em cima sekinîne, em cima li peyen xwe
xwedî dernakcvin? Tu kesî ji vvana di xwede ev cireta nedîbûn ku peşde
herin. Tirsa vvan ji cendirman zedetir ji peyayen xwe bûn. Gelek
serme ku nave jinan tevî van bûyînan bibe. Bi meren biyanîre ziman
gerandin û deng kirin qedexeye. Ji bapîren xwe, vver dîtibûn. Car ca-
213
ran hinekan, guh nedidan ve revvşe. îro jinen Tendureke, ji tirsa meren
xwe, ji ciyen xwe nediliviyan.
Oumandar diranen xwe diqirçiyand. Gelek vvestiyayî û perişan bû.
Li ser ve bûyîne qet tiştek deste wî neketibû û tiştek jî hîn nebûbû. Çep
û rast bi leb û tepan, bi pîhnan li gundiyan xistibû. Hal teda nemabû.
«Eze, li peş van rezü bibim» digot. Levvra ji ciye xwe nikaribû büipitiya.
Palek sibe heta evare bbcebitiya, dîsa jîji vvîjîrtir bû. Milen vvî, bi
l&ristine tevizîbûn, bûbûn vvekî kulavan. Pflen vvîzef qerimîbûn. Nika
ribû meşan ji xwe biqewitîne. Jiyen hustiye vvî, vver hatibûn ragirtin,
vveke masuran peît bûbûn.
Ro çû ava. Hevv li pist çiyayen bilind tîreja vve xuya dikir. Evv jî he
dî hedî vvinda dibû. Demeke şûnde tariye vvekî serlehefek reş, vve der
dore büehîfîn. Awqas meriv, ye pe çi bikira? Xebera wî ji birîndare
çûyî jî tunebû. Di nav du avande mabû. Şev daketibû. Pencî, şest me
riv vvekî kerîkî pez jendibû. We niha çi bikira? An gişta berde. An jî
bi peyvvanda bi hev girede û bibe bajer. Vegeriya cendirman:
Hazir bikin. Eme hinekan bi xwere bibin. Bira li vve dere jî ya
rastî nebejin. Evve vve çaxe bibinin.
Gundiyan xwe sipartibûn hev, li ser tûtikan rûniştibûn. Cendirman

evv rakirin dane rezeke. Kî dihate peş qumandar, wî ruyen vvanî birîn dar meze dikir. Yen ku bi sûc û be sûc, li gora hişe xwe dijbart.
Ez careke tene ruye kesekî meze bikim, ez zanim evv çi kese. Ez bi xwe bavverim.
Yen kal û yen ku bi dîtina wî be sûcin, careka din da tirsandine û gelek gotinen kemasîji vvanre got.
Herin malen xwe. Dile vve ku dbcvvaze, dîsa netebiye dendn. Ez ku careke din vverim, eze nîşanî vve bidim ku dine çend perçeye.
Yek, duduyan:
Bele, le cîranen me? Evve çi bibin? Çi sûce vvan heye? gotin.
Oumandar ji nüve qîrya.
Ezjiweredibejim,herin.îcaxwexilaskirine,nihajîketinederde cîranan. Hade yalla. Ez ji nüve dest pe nekim.
Ji tirsan, tiştek le zede nekirin. Beren xwe dane malen xwe. Bi ser milanve, cîranen xwe meze dikirin. Lingen vvan peşde nediçûn. Bi ve gengaziye çar neçar razîdibûn. Dizanibûn ku çiye be sere cîranen vvan. Ji ber ve gelekî dilteng bûn.
Oumandar sî û du zilam ji vvan bijart. Çar bi çar dane reze, bi deh cendirmanve şandine bajer. Cendirmen bi sûngîre got:
Hedar bin.
214
Ji bona çav tirsandina gundiyan, zivirî aliye cendirman.
Yen ku gura vve nakin, bi mirine lexin. We fem kir ne? got.
Bele qumandare min. Ser sera.
Dîtin û savva vvan li derheqe cendirman, gelekî hatibû guhartin. Kal û pîr, jin û mer, zar û zeç, vveke bere girî û havvar nedikirin. Li ber dî vvaran, li ser xaniyan, desten vvan di paşilen vvande, stuxwar, derde xwe

dadiqultandin. Hen bi pisporî, bi ser xwe, züamen xwenen di nava sungiyande
meze dikirin. Evdojî li tev vvan bû. Serî di berde, bi gaven şist,
di nava hevalande vvinda bûbû. Soro û Mîro li keleken hevdû bûn. Se
ren vvan bilind, di nav peçiyande cbcaren vvan hebûn. Rûyen vvan nedikeniyan,
le tirs jî di çaven vvande tunebûn. Ya rastî, qumandar bere
jîçend cara ku meriv dibirin, gele kesan bi lavayî, stuxwarîxwe diave
tine ber ling û desten vvî. Vaya bi xweşa wî dihat. Gava ku sûc gengaz
bû, devje berdida. Caran jî xwe pir giran digirt. Ji vviya pir hez dikir.
Ve çare ne vveke çaren bere, gundiya ji bona tebuhartiya heval û hogiren
xwena, xwe nediavetin dest û linge qumandare cendirman. Diranen
xwe diqirçandin û bi avvirekî tehl li qumandar û cendirman di
niherîn.
Gava ku qumandar li keleka şofer, kete jîpe, ji gund revvî bû, çend
xulamen axe bi nîv tirs dûrve qumandar revvî kirin. Oumandar qet rû
nedabû van kesan û ji gund derketibû. Birîndaran, pîrekan, zar û zeçan
di bin çavan, vvekî biyaniyan li qumandar diniherîn. Bi ve niherandine,
heznekirina xwe û alîkîde jî tirsa xwe didane rûye qumandar.
Tariya evare li ser erde digirt. Hevva gelek xweş bû. Jiyana evare, li
gund... Ne minanî evaren dine. Jiyan şirîn û dine bi rûken, le dev û zi
mane tendûrekiya tunebûn. Çaven vvan bi kîn. Geleken vvan li birîndaren
xwe diniherîn. Hevalen vvan, niha di nava singo, gaven vvan bi
zehmet bi vvanre dikişiyan. Gundiyan niha evv hevalen xwenen di re
de bûn, dianîn ber çaven xwe. Çend meren mayî, ber xwe diketin ku
cima evv jî nehatine şandine. Şerm dikirin. Dile vvan nedbcvvest ku li
rûyen jin û zaren ye mayîbiniherin. Zanibûn ku tu sûce vvan tunebûn.
Le dîsa jî dibccmgîn bûn. Dema ku birînen xwe dipeçandin û dişûştin,

hevalen vvane çûyî li ber çaven vvan bûn. Gelo çavva re hildidan? Ev riya direj, we çilo biqediya?
Jina Soro nedixwest ku giriye xwe nîşanî kesî bide. Li cem vve, çend caran, çiqas gotinen dibcvveşî û dilsozî hatibûn gotine. Niha dihate bî ra vve, Soro, Mîro, Seît û xwarziye wî Elî, li male çi tehrî peyîvîbûn.
215
Em çi bikin, bikin le bibine yek. Ji ber zore, tirşe anjî hine menfeeten piçûk, ji hevdû neqetin. Her tişt bi ve dereve giredayiye. Rojen teda û teng ten û derbas dibin, diçin...
Paşe tiştek hate ber çaven vve, ji ber, eşen dile vve zede dibûn û li ber xwe diket. Par, çilo Soro kutabûn. Perişan, vvekî miriyan kiribûn. Çend roja li mere xwe niherîbû? Dîsa jî zû nehatibû ser xwe. Çiqasî nexwestibû ku eş û derde xwe nîşanî kesî bide... Di ve demede gelek tişt ji mere xwe hîn bûbû. Mîna bere nîn bû edî. Soro ku ne mal bû, pir bencvve nediket, zû zû nediçû û derîve nediniherî. Evve jî zanibû edîbi ve feqîriye, jiyana baş û rehet nedibû. Tiştek nedayî, tiştekî dine nedi hate sitandine. Ji bo erden xwe, gerek pir tişt bidana û hazir bibana. Bere jî di nav tengasiye û belengaziyede bûn. Bi xwe xwe diqehiriyan û dizariyan. Niha ne vvüo bûn. He li vvan xweş dihat. Derd û tedan mî nanî bere, bi girî û gazin qebûl nedikirin. Wekî ku yekî nas te. Zani bûn çi te. Fem dikirin ku erd be derd û be belengazî bi dest nakeve. Levvra, li hemberî hemû bûyînen tûj û dileşiye gerek meriv xurt buya. Jina Soro jî ve çare he betir li ser xwe bû. Di hişe vve de, mînanî ava şelî, vvekî hevva bi mij û dûmande baş neye xuyane, le dîsa jî, li hem ber sekinandin hîm dida. Mere vve pir zordestî dikişand, le vve jî hedî hedî dibcvveşî didît di van bûyînande. Ne vvekî ku ji mere xwe hez di kir. Ev tiştekî din bû. Le dîsa jî him tehl, tûj û him jî şirîn bû tema vve.

Ne mînanî hezkirina zaren xwe. Tiştekî dine. Kînge meriv tema vve hildide,
vve çaxe zane çiye. We çaxe meriv xurt û bi ser xwe dibe.
Kare xwe xilas kir, çû cem jina Mîro û zaren vve. Jineke jîr, hestî mezin û qalind bû. Heta niha gelek derd, belengazî kişandibû. Çend sala bere, biraye vve ye xort li eskeriye, li xerîbiye miribû, dergistî bû xwe jî. Bo vvî, çiqasî giriyabû û kiribûn zarîn. Bave vveyî topal ku paşe herd çîpen wî kişiyan, nikaribû ne mîz ne jî destava xwe ya mezin bi ke. Her roj bi desten xwe, çend caran mîz û gûyen wî paqiş dikir. Paşe dema ku zevvicîn, vvan herse salen peşîn çi kişandibû ji zimane xwesiya xwe. Zimane xwesiye vvekî ye marane. Dire dira vve, zike meriyan zer dikir. Le niha behemdî xwe dest bi girî kiribû. Piştî girî, rehet bû ana. Tengasiyen dile vve, bi nîvî nîvî nemabûn. Cîrana xwe ku li cem xwe dît, her tişt bîra kir û dest bi kare male kir. Evvanan jî mînanî meren xwe, xwe nezî hev didîtin.
Lele xwenge, evv çiye? Dibe ku tu giryayî?
Welle nizanim çi bû. Giriyan hinekî. Niha tiştek nema. Hela, vve re, rûne.
216
Qîze, xulî li sere tebe. Meren me qewîne, qet tiştek jî bi vvan na be. Cima tu nizanî? Gişt hate bîra kirine. Ne bîra te qet, par hale me re min çilo bû? Me çi nekişand? Gişt çû, derbas bû.
Li ser van peyivan, her betir bi jîr û sebir, gerek li kar, bare xwe me ze bikirina. Herdûyan, wisa qerar dan. We zaren xwe ji nexwaşiye û mala xwe ji xirabiye biparastana.
Şeveka bihareya xweş û henik. Gund di tariyede bû. Li esmanan be hesavv isterk dibiriqiyan. Li mala axe, bedengî û kerrbûneka vvekî miriya hebû.

Nezîkiya sibe cendirme û gundî gihîştine bajer. Wekî koma girtiyan bûn. Di rede pî û çîpen gelekan vvestiyan, qerimîn. Le dîsa jî nedbc vvastin ku bibine bare hustiyen hevalen xwe. Ji ber pîhnen ku li sîngen vvan ketibûn, çend kes ji vvan nikaribûn bîhna xwe baş hildin. Zû bi zû radivvestiyan, bîhna xwe hildidan. Gaven vvan bi vvanre nedihatin. Peşiyede cendirmen bi sungî, li ser gura qumandar gelekî bi tûjayî û be însafî evv dibirin. Paşe vvan jî dît û fem kirin ku sûce vvan nînbû, nikaribûn reve herin, gaven xwe zû bavejin. Hedî hedî rez û Rewşa çûyine şist kirin. Herkes qasî taqeta xwe diçû. Cendirman bi xwe jî vvestiyabûn edî. Bere çend pişkoken çaketen xwe vekirin. Tivingen xwe havetine milen xwe. Gundiyen belengaz nikaribûn ku du gava bavejin, îca vve bi küre ji ber vvan bireviyari? Cbcare dan hev. Li ser kaniye serçaven
xwe şûştin, birînen xwe paqiş kirin. Li dora kaniye, daren nizm vvekî çepereke bilind bûbûn. Peyiven nav gundiyan û cendirman her peşde çûn. Tendurekiyan jî tegihîştin ku tu sûce cendirman tunebûn. Ji vvanre çi hatibû gotine, evv jî vve tinine cî. Cendirman edî vvekî dost û biran bi vvanre revvîtî dikirin. Qala bajaren xwe, qedandina eskeri ye, şer û giliyen li ser erde ku li vvan bajaran dibû, dikirin. Caran hine heval di pare diman, nikaribûn bihatana. Yen dine li heviya vvan dise kinin. Le caran jî ferq dikirin ku dereng mane, vve çaxe jî, gaven xwe bi lezûbez davetin. Bi dostî dipeyiviyan. Gundiyan ji van peyivan fem dikirin ku ev xort, ev cendirme ne dijmine vvane. Di dilen vvande dos tî hebû. Xenji yek, duda hemû gundî bûn. Ji revaçûyîna vvan kifş dibû. Yen ku ji gundan bûn, betir rehet re hildidan. Yen ku ji bajaran bûn, zû zû xuhya eniyen xwe zuha dikirin. Pife pifa vvan bûn. Hela he bîstekî neçûyî, disekiniyan û bîhna xwe distandin. Evv jî xorten baş bûn. Wexta ku gihîştine qereqole, edî kesî nikaribû gaveke jî baveje. Te

digot ku lingen vvan, ne bi vvanre bûn. Wekî kulavan be ruh û kişyayî bûn. Şev henik bû le dîsa jî kirasen vvan di xuhyede mabûn. Bîhna xuh-
217
ye tevîhev dibû. Çend kesen ku birînen vvan zede bûn, bi alîkariya he valen xwe güüştibûn qereqole.
Eşkere li ber qereqole ku evv bi tevayî dît, şaş ma. Ve şeve vve avvqas meriv li ku bi cîbikirna? Bi denge nûhatiyan, cendirmen razayîjî hişyarbûn, hatine cem hevalen xwenen vvestiyayî û perişan. Di carekede qereqol û hevvşa vve, tijî gundî bû. Çeken xwe derxistin, darde ki rin. Dest ruyen xwe şûştin. Paşe gundiyan jî vvekî vvan li vve dere, xwe şûştin û henik bûn. Cendirman dbcvvast ku zûtire razen. Ji xewe, çaven vvan dihate girtine. Nikaribûn xwe li ser lingan bigrin. Yek û yek, «em diçin, radizen» digotin û diçûn.
Dere girtîgehe vekiribûn. Bîhna kefike û neme dihat. Meriya digot ku dîvvar di avede mane. Yen birîndar û çenden dine hildane odeke. Li vve dere meriv dikutan û teda dikirin, him jî bin çavande digirtin. Hela he deriye vvan nedadayî bû. Cendirmekî reş, çav û birî bedevv, hinekî bi beden qelew, digot ku «xuhe ji bine lingen mere havetiye». Wî di guhe nobedarde tiştek got. Demeke şunda, meriya zanibû ku çi je xwastiye. Çi xortekî dibcvveş bû. Nobedar ji bo van gundiyen vvesti yayî û perişan, av danî li ser kuçike nifte, xwast ku çay çeke. Paşe ha te cem gundiyan.
Cane vve saxbe, birano. We derbas bibe ev jî. Her tişt te sere me ran. Paketek cbcara eskeriye dendst, da hemûyan. Paket xüas bû. Çû ji hundir, ji ciye razane, du paketen din jî hanî. Gundî qet hînî dostiya vvüo nebûbûn bi cendirmanre. Levvra şaş, metel man. Bi çav, ev jî ji hevre digotin.
Çi xorten başin. Ve şeve birayen meriya jî avvha nakin.

Şîre he'al metiye. Şîre helal. Küre maleke mezine. Dine dîtiye merikan. Cendirme ji vvanre got ku birîndar ne baş bû. Levvra zûtire şandibûne nexweşxana vvîlayete. Doxtire vir gotibû ku nexweşxanen mezin, haceten rind û filim jere dbcvvaze. Wexta ku birîndar şandine, hale wî qet ne baş bûye. Qaymeqam û savvcî çend caran bi telefone hatina qumandar pirsîne. Oumandar seseheta piştî evare hatibû, qaymeqam
û savvcî ji malen vvan pirsîbûn û yen bûyî ji vvanre qal kiribû.
Dûrve denge dîkan dihat. Pir tarîbû niha. Gundiyan zanibûn ku, ronayî edî nezîke. paşe çîvik, gîha, av, meriv û dine gişt vve hişyar bibe.
Van herdu öden qereqolede, gundiyen belengaz bi carekede ketibûne xewe. Serî dabûn ser hev. Wilo çep û rast direj bûbûn. Bihustek cî kî vala nehiştibûn. Nobedar li ser vvan, derî dada û çû. Wisa vvestiyabûn ku vve deqîqe ketine xewe. Yen ku birînen vvan pir dieşiyan, dina-
218
liyan car caran. Di xewede xeber didan hinekan. Le kesîji devan vvan tiştek fem ne dikir.
Ro derketibû, her der dibiriqiya. Bajer dest bi rojeka nû kiribû. No bedare qereqole hatibû guhartine. Der dor berev dikirin li qawîşen cendirman. Cendirmen ku şev hatibûn, nû hişyar dibûn. Hevalen vvan evv ranekiribûn. Ji bo taşte, dema ku evv jî rabûn, edî gundî jî hişyar bûn hedî hedî. Her deren vvan tevizîbûn, dieşiyan. Nikaribûn ku seren xwe ji erde rakin. Te digot ku sîtüeka giran li ser sere vvanaye.
Eskeran der li vvan vekir. We bi dor biçûna avdestxane. Le eskeran mînanîşeve, nermüc û bi dostî nedipeyiviyan. Ya xwede, tiştekî ne baş jî nedikirin. Gundiya fem kir ku ji tirsa qumandar vvüo dikin. Çi hati bû guhertine? Eskerekî, bi peren vvan, ji vvanre nan û pener kirî. Li cî kî fýreh, li ser «ciye xwarine» nivîsandî, bi tevayî taşte dbcvvarin. Evv

cendirme qemer, şev ji vvanre çay çekiribû, dît ku nan û pener naçe xware, ji vvanre ava sar hani. Dema ku qumandar hat, ev kar hemû qediyabûn
edî.
Oumandar ser, rûye xwe kur kiribû, vvekî xortan bû. Li kaxizen peş xwe niherî ku tu tişten nû hatine an na. Pişta xwe siparte davviya kursiye. Sere xwe büind kir, hevraz niherî. Hişe xwede xwast ku rezeke
çeke ji bo îro. Li bajer, li ser lingan, virde vvede, ji hinekan di derheqe küre Ûsiv axade xeber girtibû. Li nexweşxane razandine. Hale vvî ne baş bûye. Hela he çaven xwe venake û nikare bipeyive. De û bave vvî li cem, ü nexweşxane bûne. Bere her tiştî gerek ji doxtore nexweşxanere
telefon bikira û rapora di derheqe Maruf, bbcvvasta. Dibe ku rapora davviye îro nedin, qet nebe, rapora hale wî niha dikaribûn bişandana. Paşe vve xeber bida savvcî û berpirsiyara vvan bigirta. We jere, bi telefime, nexweşxane bidîtana. Heta vve çaxe nivîsdar û mekîneke
nivisandine anîne oda vvî.
Li ser maseke piçûk, makîneke nivisandine ya mezin û hine herfen vve ketibûn. Nivîsdar kaxiz kire makine û li heviya qumandar sekinî. Xwast ku yek û yek gundiyan binine ode.
Li peş xwe, gundî dît, dîsa qehirî û rûye wî tirş bû. Gundî di nav tozede bû. Li erde razabû, ser milen vvî, pişta wî gişt di nava tozede bûn.
Bi desten xwe paqiş kiribû, le tere nekiribû. Hela li ser şewqe wî jî toz hebûn. Dibe ku şewqe xwe dabû bin sere xwe. Şewqe di destde, rûye vvî vverimî bû, li bin cenge, yale raste, du birînen ne pir kur dihatin xuyane.
Bere nave vvî, de û bave wî dipirsiya. Paşe vvan pirsen ku li gund

ji vvan pirsiyabû, duçar dikir. Dizivirî û bi nivîsdar dida nivisandine. Bi nermik şîret li gundî dikir.
219
Binher küre min. Tu gunehî. Be aqüiye.neke. Ke ev karan kir,
vvana vvekî meriya beje. Lexe here mala xwe. Bi eynad kirine tiştek nakeve
deste te. îca, tu vana li hemberî ke dikî? Çave xwe veke, li min
binihere. Te ü peş ke vira bikî? Ya rastî beje. Tu li yen dine nenihere.
Eze te ji nav vî karî denrim, qet şahid jî nanivîsîm te. Eðer nebe, eze
te bişînime ba savvcî, tu seroke vvanayî. Qet te guhdarî jî nake, vve te
baveje hundir. Te, vve çaxe roja xwe bibînî.
Bersiva gundî vvekî ya bere, ya gund bû.
Gundî hemû hebûn. Nizanim ke lexist. Qet kes jî ne rebere, renîşane.
Kesekî wisa jî nas nakim.
Oumandar diqehirî, le nedbcvvast ku nîşan bide. Bi nermik, dîsa ne
zî wî bû.
Lavvo, küre min. Qet hişe te hildide cima? Him tu li vvir bî, him
jî tu nebînî ku ke lexist.
Bege min, vvalle gundî hemû l&rist. Walle, bille giştan lexistin.
Bele. Te jî lexist, te jî kevir avetin?
Bele min jî lexist. VVekî hemûyan.
Oumandar vvekî yekî ku bi dore, ji neçîra xwe bigre. Reka nû, derîkî
di dile xwede dîtibû. Zivirî ser nivîsdar:
Binivîse küre min. We roje min jî, li Marûfe küre Ûsiv axa xist.
Te, bi çi lexist? Bi keviran an bi daran?
Bi daran, bege min.
Te li kî dera wî xist?
Nizanim.

Çavva tu nizanî? Çiye ku te bi daran lexist, tu nizanî?
Nizanim. Na xer nizanim.
Dîsa bi ale nivîsdarde vegeriya:
Binivîse. Min bi dare deste xwe lexist. Le nizanim, li kî dere ket.
Çend cara, min li her deren wî xist. Kesîji minre negot ku li wîxe. Min bi xwe qerar da û lexist.
Paşe hinek tişten dine jî da nivisandine. Oumandar rind zanibû ku bi ve gotine, gundîbi xwe sûcdar dike. Levvra bi tiliyan, gotinen wî da ne navnîşandane. Gundî ku derdikete derve, telefone lexist. Serdoxtore nexweşxane bû. Xwe pe da naskirine, xwastinen xwe jere got.
Bege min. Duh, küre axe Tendureke, küre Ûsiv axa birîndar ha te vvir, nexweşxane vve. Hale wî çavvane? Heke ku ji deste te te, kerema xwe, rapora wî bişine.
Awqas ne başe. Çi ji deste me te, em dikin. Meriv. nikare ji nihave tiştekî beje. Rapordayin anha zehmete.
220
Bele bege min. Min bibaxşîne. Tu jî zanî me û savvcî dest daye ser bûyere. Qet nebe gerek di deste mede raporeke ku hale nû nişan dide, hebe. Heke ku xetera mirine, gerek meriv ji bo vve, her zede li ser bisekine.
Ere. Ere. Zanim. Eze niha rapora peşîn bişînim. Xetera mirine heye. Bele eze îro bidime nivisandine. Xetera mirine him jî pir zedeye.
Spas dikim. Tu çilo baş dizanî, bira wisa be. Ser sera, ser çavan.
Telefon danî cî. Nerehetiya wî her zede bû. Serde jî küre dostekî vvî, li ber mirine bû. Ye duda ku hildane ode, ye peşîn şandine qawişa cen dirman.
Li ser ye nûhatî, çaket tunebû. Kirasek û li ser wî elegek hebû. Eniya vviya ale raste vverimîbû. Sere wî şikestî, pore vvîbi xwîneve tevîhev,

vvekî qetrane, li ser eniya wî zuha bûbû.
Binhere küre min. Hevale te her tişt got. Em her tiştî zanin. Tu jî beje û xüas bibe. Ev kara di deste ke hatine cî? Hevale te yek bi yek ji mere got. Nebe, nebe tu be aqüiye dikî, ya rastî nebejî.
Çilo? Ez tiştekî nizanim ku. Ez jî vvekî hemûyan li vve dere bûm.
Tu kesîjî ev bûyera nedaye kirine. Ez kesekî wisa nasnakim.
Çavva kesekî wisa tüne? Hevale te cima derevva dike?
Vira dike. Derevvîn dibeje. Ez nizanim. Eðer evv dizane jî ez ni zanim.
Lavve min. Tu feyde vvüo kirine tüne. Me nede zehmet. Yeke jî, lexistine bîne bîra xwe. Eze li te xim. Tuyî be sucî. Ke kiriye, vvana be je. Wekî hevale xwe, here mala xwe.
Welle, bille. Bi namus tiştekî vvüo tüne.
Kuro, niha eze dest bi namusa te bikim, ha.
Dît ku befeydeye, ji bo wî jî da nivisandine ku evv jî li vvir bû, bi dar û keviran li Maruf xistibû. Tilya wî li kaxize xist.
Gundiye duda ku çû cem hevale xwe, le bû ku wî saxî saxî bbcvve. Bi qehr le diniherî. Li ber deren vvan cendirmek hebû. Bi dengekî nizm ji gundiye xwere got:
Benamûs. Te şiltax avetine ke? Bo tirsa qûna xwe, te ke avete agir? Ere?
Şiltaxe çi? Kuro te hişe xwe vvinda kiriye?
Le qumandar got «hevale te her tişt û naven reberan yek û yek got.»
Be aqile heram. Xwastiye ku te bbcapîne. Dibe ku tu xapiyayî, te gû xwar?
221
Here kare xwe! Ez kîme? Tu min nasnakî cima?

Cendirme fem nedikir ku çi dibejin di navxwede, sere xwe direj kir, işaret da vvan ku kerrbin.
Çaven qumandar ji kîjanan dibirî, «binher, hevalen te dibejin ku tu jî rebere vî kariyi, tu didî kirine» digot. Kenehû ji kaxizen peşiya xwe gotinen hevalen vvanen bere, duçar dikir. Dîsa jî tiştek li deste neket. Heta niha qet vviha nebûbû. Ji karen gelekî tevîhev, qet nebe dîsa jî piçek sere bend bi dest dbrist. Le ve çare, her tişt vala dbcuya. Levvra diqehirî. Le sebir dikir ku dibe ku yek ji vvan xeber bide, her tiştî be je.
Gelek ji vvan, bi gotinen xwe sûce xwe qebûl kiribûn. Mehkemande gelekî li ser van gotinan disekinin. Qerardayînede li van diniherîn. Niha Soro li peş wî bû.
Tu dîsa hatî peş min? Ev çiye ji deste te dikşînim? Mezeke, he valen te dibejin ku Soro em şîret kirin ku li Maruf xin. Te ve çare çi bejî? Binher, eðer dbcvvazî, ez ji tere bbcvvînim. Penc, şeş kes wisa di bejin.
Derevve. Min tu kes şîret nekiriye. Kîne evv penc, şeş kes? Nave vvanan beje?
Le. Le. Tu li bege min binihere. Cima nave vvanan ji tere bejim?
Tu nizanî ku te ke şîret kir? Te aqil da ke?Soro tegihîşt ku dbcvvaze vvî bbcapîne. Tiştekî wisa hebûya, vve nave vvan jî bigota, vve evv bihanîna peş hev. Dbcvvast ku li ser vvîde bigre. Soro got ku evv jî li vve dere bû, evv jî vvekî hemûyan li tev lexistine bû. «Hemû li vve dere bûn, mînanî vvan, min jî lexist», hetanî gotinen wî bi vî tehrî nehate guhartine, bin nivisandine navnîşan nekir. Oumandar li ser hember sekinandina vvî, gelekî bi hers bû. Soro yekî vvekî rûviyan bû, bi dîtina qumandar. Le dîsa jî xilasbûna wî tunebû. Bi şîrinî, bi nermayî tiştek bi dest nexistibû qumandar. Li peş van gundiyen beqîmet, kar nebiribû serî. Levvra

dilteng bû, bi pirçî bû.
Lexistina duh, tera van berazan nekiriye got di dile xwe de. Ve ça re vve herboqe vekira. Sere bend bidîta, göre vve bişkiviya... Hema ti ştekî piçûk jî bi dest keta, edî hesan bû davviya vve. Paşe fikirî ku goti nen vvan hemûyan mînanî hevdû bûn. Qet sika wî tunebû. Evanan ça vva gişt vvekî hev xeber didin? Cima qet yek jî bi tehrekî dine napeyive. Na... Na. Hinek, van hîn dikin. Nedihate dîtine, le eşkere bû ku vvi sa bi sere xwe nedibû. Şeytanek, xinzîrek di bin vî karide hebû. Ou mandar bavver dikir ku yek ji van Soro bû. Hate bîra vvî, cara dine çi lo li wî xistibû. Çavva netirsiya edî? Gerek niha vvekî bilbilan xeber bi-
222
da, her tişt bigota. Eðer dîsa jî nepeyive... Meriv şaş dibe li ber jîr û xurtbûna vvî.
Dile wî her dihate givaştine. Derkete derve. Odek hebû li ale ras te, cem girtbcane. Car caran meriv li vve dere dikutan, tişten zede dikirine.
Hate vvir. Li odede du kursî û masek hebû. Ji serokdehre got ku bira çend şiven xurt û du hevalen ku alîkariye bikin bibîne.
Yen ku hildida ode, lingen vvanan dbriste feleqe û bine lingen vvan dbast. Heta ku vvestiya. Oayişen tivinga zexm bûn, nediqetiyan. Meriv davetin erde, lingen vvan dbdstine nava qayişe û quloz dikirin. Ye di ne mabû, bi merivtaya û insafa ye ku ledbce. Hetanî ku tamîş dibûn, şiv li bine lingen vvan diketin. Hinek gelekî diqîriyan, tamîş nedibûn. Oumandar diqehirî ku cima tamîş nabin. Piştî qaseke, ve çare, her be tir ledbdst. Dema ku divvestiya, cendirme dihatin li devvsa qumandar, li vvan dbdst. Kînge, cendirman bi dile qumandar lenedbdstin, her hers dibû, şiv ji deste vvan hildida:
Lavvo, cima hûn gûzan hûr dikin? Avvha... Avvha... Digot, bi he

mû quweta xwe ledbdst.
Çend kesen ku li rû û çîpen vvan, birînen lexistina duh hebûn, evvana îro di feleqede kem man. Li gund bi kefa xwe, bi dile xwe Mîro nekutabû. Ve çare heyfa vve je dendst. Mîro diranen xwe dişidand, dbc vvast ku heta davviye tamîş bibe. Peniya wî terqiya, xwîn dilop dikire erde. Bere peşîn şiven ku li bine linge wî diketin, te digot ku vve cane vvî bistînin. Paşe hedî hedî edî lingen wî bibûne vvekî kulavan. Mînanî ku ne ling û çîpen vvîne. Li bine piyen wî dbdstin, le li ser piyan divverimîn, bi xwîna reş dibûn. Mîro deng nedikir, tamîş dibû le qumandar bi qehran le bû, bimre. Hetanî ku «of, of, küre kere, ez jî bi tere mi rim» got û dar avete alîkî. Xwastin ku wî rakin ser lingan. Le nikaribû rabe. Piyen wî bi pînen şil peçandin. paşe kirine nava vedrokek av. Ke tin bin milen vvî, evv gerandin. Pî û çîpen wî vverimîbûn.Hetanî nîvro bi vî tehrî lexistine kişand. Yen ku kare vvan li qereqole hebûn, nehîştin bene hundir, vve bi piştî nîvro bihatana. Li qereqole piraniya cen dirman, be xeberdan, karûbare xwe dikirin. Dihate kifşe ku van tiştan di dile xwede qebûl nedikirin. Oumandar ku çû mala xwe, av hanîn dane gundiyan. Dest û piyen vvanen birîndar şûştin, pemûye bi tentür diyot tedan. Ji dikane, ji vvanre xwarin kirîn. Le bele kesekî tiştek nekire deve xwe. zimane xwe le nexist. Li ser ve cendirman her betir li ber xwe ketin. Ji hundir, rojnameke kevn hanîn, xwarin peçandin ku evare bbcvvin.
223
Hetanî esre kesek nehat û evv nepirsiyan. Li ser çimentoya henik, çend kes ji vvana xewre çûn. Hinekan linge xwe di nav desten xwede mizdidan ku eşa vvan kem bibe. Çûyin, hatin dibû li qereqole. Denge telefonan û gas kirinan. Qet kesekî ferq nedikir, gelo van herdu odande çi heye, çi tüne?

Çend kes ji gundiyan difikirîn ku piştî ewqas lexistin, edîji nû dest pe nakin. Soro û çende dine digotin ku vve bi şev dîsa dest pe bikin, le gerek em tamîş bibin. We çaxe ye dine:
îca em tamîş nebin eme çi bikin? Ye ku hatiye sere me, eme bi kşînin. Xüasbûn tüne, digotin.
Oumandar çilo xwastibû ku vvan bbcapîne, hevalen vvan bide dest.
Bi hevre bi laqirdî dipeyiviyan. Lîstike qumandar çavva gişt, vala derketibûn.
Duşa û pe bi kef dibûn. Qet yek jî nehatibû xapandine.
Oro ez te zanim. Ji minre dibeje ku hevale te nave te da. Tu van tiştan didî kirine, em giştî zanin. Were tu jî beje û xüas bibe. Ez te za nim. Tu şiltaxen vvüo nakî. Paşe hate bîra min. Him dibe ku hevale te got, tu didî kirine, him jî dibe, beje û xüas bibe. Heke ku ez didime ki rine, reberim, eze çavva xüas bibim? Min fem kir ku gişt vir, derevvin.
Yekî dine:
Cima me jî wisa nedikir, li gund? Tiştekî dizî an jî tiştekî vvinda bûyî ku me dbcvvast bibinin. Me çi dikir, naye bîra te?
Hinek ji vvanan birçî bûbûn, le mede vvan nediçû, nedbcvvastin ku tiştekî bbcvvin. Cendirmekî dere vvan vekir. Oumandar kaxizek di des tde. Gişt rabûne ser piyan. Hinek bi zehmet li ser xwe bûn. Xwe sipartibûne
dîvvaran. Çend nîşan li kaxize dbdst, bi nav nav xwest ku vvan bibîne. Kaxiz da cendirme. We yek û yek bihanîna oda qumandar. Wî bi xwe, ji reza peşîn, çend kes bi xwere bire hundir.
Li oda tedaye bûn edî. Wan jî ev ode rind nas dikir. Oumandar be bavver ji vvan dipirsî ku çi zanibûn bira bejin. Bi xwe jî fem dikir, tu ti ştekî baş nikaribû hîn bibûya. Hela he, «ez tiştekî nizanim» xüas nebûyî dest bi pîhn û sîlla dikir. Du cendirma linge yekî dbdstine feleqe.

Çarbcen wî dendstibûn. Oumandar:
Na. Na. Şiveke he qalind. Darekî he qalind bînin, got.
Darek hanîn. Te digot ku ne şive, merteðe ku meriv pe ser xaniyan digre. Gundî dabûne ser qulofîska. Dar kirine feza kapen vvî. Cendir mekî beteşe, piyekî xwe da ser alîkî û yen jî ser ale dine. Li ser rabû pe. Gundî qet tiştekî avvha nedîtibû û ne jî bihîstibû. Te digot ku ke ran tere dikin. Bende pişta piyen wî diqetandin. Sed şiv li bine linge vvî xistana ji ve baştirbû. Wekî elektrik ji dil dikişiya heta mejiye vvî.
224
Hundire wî dihate deve vvî, dikişandin, diqetandin. Cendirme ku xwe düipitand, li ser gûzik û kapen vvî, ruhe wî derdiket. Paşe rakirin ser piyan. Rûye wî di navxuhyede bû. Kulm li ser hev dihatine li ruye gun dî û di nav xwînede hişt. Oumandar vvekî dîna bû. Dev leven gundî di nav xwînede. Le niherî, nezîk bû. Simbelen wî kire nav tiliyen xwe. Bi kokeve hilgirt. Simbel bixwîneve di deste qumandarde man. Çend hesir ji çaven gundî hatine xware û berjer tevî leven wî yen bi xwîn bûn. Zimane vvî, şorbûna hesiren giryan û xwîna germ ji hev dernexist. Be rî her tiştî, bo vî halî, bo simbelen xwene hilgirtî li ber xwe ket. Gele kî le giran hat.
Wüo neke, qumandar. Wüo neke. Tu jî merî. Merî vvüo nayne sere mera.
Loylo. Niha te aqü bidî min îca? Ere?
Dîsa rikefî ser wî kir. Wî xwe da alîkî. Gaveke şûnve çû. Oumandar pîhnek avete. Gundî texmîn kiribû, ve çare xwe revande ale dine, Lin ge qumandar li hevve, vala ma. Hejya, li ser mile xwe, nezî mase, li er de ket. Mile wî di bin vvîde ma û eşiya. Çaven wî edî dine nedidit. Gun dî jî, li erde ketina wî ji rûye xwede zanibû, levvra, tirsana ji ciye xwe nedilipitî. Diricifiya.

Gundî ku ji ode derxistin, tu cara îro û ev kutana, ji bîr nedikir. We di jiyîna xwede, heta hete bihaniya ber çaven xwe. Ketin bin milen vvî û birin.
«Xwede kir ku mile minî raste nîn bû» digot qumandar û dil henik dibû. Hinek kirine feleqe. Cbcare dadimirand li sînge hinekande. Çi dihate hişe vvî, vvüo dikir.
Dora Soro bû. Xwe jî vvestiyabû. Le dîsa jî dbcvvast ku Soro ji gişta zedetir bikute û perişan bike. Her tişt ji bin sere wî kûçikî zer derdikeve digot, bi xwe xwere. Beşik. Tu le naniherî, mezekirina çaven vvî qet ne mînanî kesekî dineye. Bi şeytanî, rûvîtî dinhere. îca çilo jî li hember meriya disekine. Tu dibejî ku dbcvvaze nîşanî min bide ku evv ne vvekî yen dineye. Ji vvanan ciheye. Heke ku evîçûr devje berde, yen dine duhve qebûlin. Ev nahele.
Bere destekî Soro, paşe ye dine peşde kirin. Direj kirin, kirine na va qayişan. Sere peçiyen wî sor, paşe heşin bûn. Derzî li sere peçiyen vvîre dikirin. Her çare ku derzî tere diçûn, eş hetanî dil, hinave wî dikişiyan.
Ode li ser hurdişiya. Hiş di serîde nedima. Derzî ku zûtire, li ser hev, sere tilyan dikirin, eş jî li ser hev sivvar dibûn. Meriya dikari bû tamîş bibe. Xwîne dilop dikir ji devvsa derziyan. Du, se cara rûye xwe qirçimandibû, «ax, of» gotibû. Le dîsa jî xwe navetibû ber dest û
225
piyen vvî. Xwe navetibû ber bexte vvî. Dibe ku bibaxişanda vve çaxe. Soro ku kerr, bedeng disekinî, qumandar he betir bi hers dibû. Rûye vvî tijî dilopen vvekî ava sar bûn. Desten wî di nav qayişan, diricifiyan. Derzî ku nezîk dibûn, vvekî çaven tiliyen wî hebûn û derzî didîtin, ji ber düeriziyan û xwe şûnve dikişandin.
Oumandar li tilya wî ya ale çepe niherî. Direj bû neynûk, zûve nehatibû

jekirine. Dibiriqiyan û ser jîbi rez rezîbûn. Kerpetenek xwast.
Jere kerpeten hanîn. Kir ku neynûke texe nava herd leven kerpeten. Soro nedihîşt. Heta niha qet neynûken wî nehatibûn kişandine. Le ge lek caran bihîstibû, çiloye. Dibejin ku pir dieşîne. Ji birîna gullan pirtir devvsa birîna neynûkan dieşe, digotin. Levvra tiliyen xwe nedida û li hember disekinî. Li ser ve, desten wî yen ku di nav qayişande şidyayî, her betir hate givaştine. Bi şivan li deste wî dbdstin.
Deste wî her bişidînîn, got qumandar. Cendirmanre qehirî. VVan he şidyayî û nezîk girtin desten vvî. Kerpeten niha neynûka Soro xistibû nava leven xwe. Him dizivirand û himjî kerpeten dikişande ale xwe. Soro bela xwe dîtibû. Kesî nizanibû ku çi dibeje.
Way daye. Ez mirim. Ez mirim, digot û xwe virde vvede davet.
Le nikaribû desten xwe, ji vvan xüas bike. Li ser milan heta zenden vvî û ji vvir heta sere peçiyen wî wisa disincirîn, dieşiyan ku nedihate go tine. Ye kişandî tene fem dikin ve. Tiliya mezin le bû biqetiya. Hestiyen vvî dişevvitîn. Nîve neynûke tene hatibû kişandine. Di nav xwînede bû. Bi eşa cane xwe, deste xwe ji kerpetan filitandibû. Dîsa di nav qayişan û di deste cendirmande bû.
Ve çare, bi kerpetane deste xweve, li rû û sermilen wî dbdst. Paşe hate bîre ku y% di destde hesine. Li mil û navmüen wî xist tene. Bi pîh nan li çok û çîpen wî dbdst. Dîsa jî dile wî rehet nedibû. Oayiş venekirî, evv birine oda satrale û telefone. Telen elektirikeyen tezî hebûn li vvir. Ji bo tedaye car cara kerî vvan dihat. Deste Soro yen bi xwîn, bi pînekî paqiş kirin. Telen elektrîke kirine kefa desten vvî. Soro bere, careke dîsa dîtibû li vir. Zaniblû, vve çavva bieşe. Oumandar makîna telefone ku bi dest dizivirand, ji bin pore Soro heta tüyen linge vvî, pe çiyen deste wî bi zexm dihejiyan, dikişiyan, dieşiyan û dişevvityan. Zirave vvî diqetiya, waxta ku qumandar, evv hacete elektrîkeyî deste xwe,

vve dîsa biziviranda. Çaven wî ji cî derdiketin û ji tirsana hema usa li qumandar dinherî. Xwede bike, bira dîsa manyeto neke û ve mîrate nezivirîne. Çend caran vvüo, hundire wî hate kişandine, qîş qîşî bû, xwe jî nizanibû. Her deren wî hişk dibûn. Çîp û inilen wî diricifiyan. Ney nûka nîv kişandî le bû, ruhe wî bistîne.
226
Zûve bûbû evar edî. Her der tarî bû. Oumandar ji bereve zanîbû ku neynûken avvha paşe pir dieşin. Çend caran vvüo kiribû... Bi tevayî dendstin her baş bû. Hinekî jî gunehe wî pe hat. Niha deste Soro ye be derman be qayiş û di nav deste eskerekî tenede bû. Oumandar kerpetan
rind bi cî kir û bi quweta xwe hilkişande jore.
Soro: °
Way bavo... Way, got.
Bi neynûka xweve xwe dikişande jore, hevraz dikir. Soro niha ü vve oda ku bo lexistine kar tînînde bû. Li erde direj kiri û ji xweve çûbû. Di nava kerpetan de, neynûka vvî, bi xwîn û goşte sor pere bû. Hevalen Soro zanibûn ku awqasî dûr, direj li hundirde girtina wî ji bo çiye. Bi dil xemgîn, merûm merûm li ruye hev diniherîn.
Ere, gelo çibû? Çi hate serî?
Cima awqasî direj di hundirde girtin?
Feqîre Soro, niha kuştin, xwede zane.
Di nav xwede qise dikirin.
Cendirman ava sar li rû û sînge wî direşandin. Pemûye bi tenturdiyotkirî, li devvsa neynûke wî dbdstin. Pesîren wî vekirin. Sîng, enî û ru ye vvî, vvekî berfa zivistanede mayî cemidî bûn. Xuhya sar li ser keti bû. Wekî xewede, çavgirtî û damaren wî be mecal davetin. Oumandar xar bû, li damare zenda wî niherî. Çû oda xwe, cbcarek vexist. Bîstekî

şûnde şewqe xwe hilda ku derkeve. Hat dîsa li Soro meze kir.
Ez diçim. Heke ku tiştek bibe... Tiştekî ne baş bibe, ez li maleme.
Haye bidine min. Texmîn nakim ku hûn gazî doxtir bikin. Haya
min nebûyî qet tiştekî nekin ha. We fem kir?
Bi gaven kurt û şidyayî lexist, çû. We şeve kesî parîk xwarin nexwar.
Dest, piyen Soro mizdan. Heta sibe li ber sere wî bûn. Cendirmekî çar
lib hevv, ji cîkî hanî û daye:
Vana hilde, bbcvve. Ev aspirinin. Du hevva bi hevre daqultîne. We
eşa te kem bike. Hilde bbcvve.
Oumandar nezîkî nîvro hat. Bere çûbû cem qaymeqam. Yen bûyî
jere gotibû. Ji vvîlayete dipirsiyan. Hinekan digot ku gund bi gundîtî
serî hildaye. Jin, zaren axe û xaniyen vvî, xwastine ku bidine ber agir,
bişevvitînin. Dijminen hûkûmate peçiyen xwe tevî vî karî dikin. Hinek
dibejin ku reberen bajer sistin, nikarin re bibin. Ya herî hesa eve. Levv
ra herkes bi xwastina dile xwe dipeyiviya û hertişt davetine hustiye re
beren bajer. "VValîjîbi telefone, xwastibû wisa beje.
227
Ez dbcvvazim ku hûn li ser vî karî pir pir bisekinin. Gerek meriv
gelekî hişyarbe. Eman, eman, rebere şist nekin, gotibû di nav xeberdana
xwede.
Qaymeqam jî rûtirş bû ji qise û gazinen avvha. Çi bikira? Li hemû
bajaran, bûyeren vvüo dibin. Cima li vvflayete, li peş çaven vvan, karen
avvha qet nabin? Cima li bajaren mezin, her tişt bi düe vvan re diçe?
Li Edene, Oonyaye, Manîsaye he jî vve betir dibin. Him jî salekede
çend caran? Gundîbikuştana? Çi bikirana ve zedetir? Dusîlla, du kulman
lexî... Paşe, vve bejin te çavva re nebir. Kar ku ne baş çû... Yek ji
vvan bimre? Seqet bimîne. We bene bi pesîra min bigrin, ne pesîra vva
lî.

Oumandar jî heq dida van fikren vvî. Paşe ji van xeberdanan cesa ret girt û du rojade çi hanîbû sere gundiyan yek, yek ji qaymeqamre got. Li ale derî ku diniherî, denge xwe nizm dikir.
Neynûke yekî min hilgirt. Ket, xweve çû, got.
Eman, eman. Pir hişyarbe. Be tivdarekiye neke. Kare me be emane. Binher heke ku tiştek be sere vvana... Bere peşîn vvalî vve te ji kare te baveje. Bela neyne sere me. Eme kare xwenî qanûnîbikin. Tu li vvan nenihere. Çend roja şûnde, vvalî û yen dine jî, vve şist bibin. Qaseke zûtir ji deste xwe dence. Bide savvcî. Bide mehkeme. Çi dikin, bira bi kin. Çi mere? Ya me revvşe bibine serî, binine cî. Me gundî girtine. Ye mayî, kare vvanaye, bira evv bikin.
Oumandar sere xwe hejand, heq daye. Rabû ser xwe.
Ezjî wisa difýkirim. Eze îro wisa bikim. Kemasiye binime cî, bişînime ba savvcî, got.
Dema ku hate qereqole, berve girtigehe çû. Derî da vekirine û li gundiyan meze kir. Be hal bûn. Ji ode bihneka ne xweş dihate poze meriya. Rû û poren vvan tevî hev bûbûn. Xenji Soro, hemû rabûne ser piyan. Ev kese vvekî çiya û zinara wisa bûbû ku nedihate naskirine. Şûnve zivirî, gazî cendirme ber deste xwe kir. Ji wî xwest ku birîn mi rîne vvana bene paqiş kirine û revvşeke baş bidine vvana. Dbcvvest îro vvan bişîne ba savvcî.
Seheteke şûnde, dema kû qumandar hat, cendirme serwaxt û hi şyar, jere got ku her tişt hazire. Le evv gundiye çûr, hale wî ne başe. We çaxe poşman bû qumandar. Xwest roja dine bişîne ba savvcî. Ma rojtira dine. Bi telefone hevale xwe, memûre sihete, Celal geriya. De ma ku bo navroje diçû male, bira xwere hine hacete birîn niherandin, peçandin û dermane jan birîne bîne.
228

Ye bi dîtina xwe hinek ji vvan bibijarta. Wek her tim ku dikir. Yen ku gotibûn, «em li vve dere bûn, me bi kevir û daran li Marufxist», vve evv bigirta û yen dine berda.
Di evara tarî û teng de:
Ku ez vve li bajer bibînim, eze vve dîsa bigrim, bavejim hundir, got û çaven vvan tirsand.
Bo kirina van karan, qumandar evare heta demeke dereng ma. We wexte, Ûsiv axa kete hundir. Rewşa küre wî berve başbune diçû. Doxtir hevîdarin ku vve baş bibe. Bi keder evana ji qumandare got. Ou mandar vvek dost û şirîk derde vvî, evv guhdarî dikir. Du roja li qereqole, rojeke jî li gund, çi anîbû sere gundiyan, gişt yek û yek ji axere got. Xenji vvana, tiştekî ku Ûsiv axa zanibû, qumandar dbcvvest ku vvan jî hîn bibe. Güî û gotinen wî da nivisandine. Ûsiv axa evv nav nîşan kir. Paşe qumandar evv kaxiz hemû kirine ciyen vvan.
Ûsiv axa dît ku her tişt bi dile wî bûye. Sipas kir û xwest ku tiştekî dine jî beje. Ji bo vî tiştî, gelekî şikede bû, ku gelo bibeje an nebeje. Davviyede qerare xwe da. Ve dela be edeb, gund tevî hev dikir, gundî radikirne ser piyan. Bira vve jî bela xwe bidîta.
Hemû tişt başin. Le bele li gund Fateke jinebî heye. Ji deh me ra xirabtire. Sere gund tîne bine gund. «Hûn çito merin, bi yekî nika rin, bi heqe vvîde nayen» dibeje û gundiya dişine ser min. Hingî Fate ku li vvirbe, vve gund li tevîhev bike. Zimanekî wisa di deve qehpikedeye...
Li ser van pirsan qumandar piçekî nikisî. Nedbcvvest ku jinan tevî van karan bike. Nav xelqede gele tişt tene gotine û pir xetere.
Ûsiv, axa evv jine. We çi bike?
Of. Of. nebeje, We çi bike. Belaka xwedeye. Mere vve tüne. Be merî, nizanim sere ve be namûse xistiye, çiye? Wekî dîna gundiya li di

jî min derdbce. Yen dine ku vve wisa dibinin, evv jî qet disekinin? Ou mandar gere meriv çaven ve pir bitirsîne. Ne vvüo pir direj. Aha bi wexteke. Eman çi delegureke evv? Tu vvere, vve ji min bipirse. Oumandar bi dilekî be xwest qebûl kir. Nedbcvvast ku Ûsiv axa xemgîn bişîne.
Rojtira dine, nezîkî tariya evare, birîndarbûn û nemirina Maruf anî berçaven xwe, hinek ji vvan girtiyan berda. Le dîsa jî hevde kes li hun dir man. Dûr û direj evv tirsandin û bi se cendirmanve evv şandine gund. Li cendirman teme kir ku ji Tendureke Fata jinebî, bi xwere bi nine qereqole. Nebe, nebe xerabiye bibîne. Heke nas û kesen vve dbc vvazin bira pere ben, ku tu kes virde vvede xeber nedin.
229
Li pey vvan qedereke niherî. Çilo bi biratî, dostî û dibcem ji hev qetiyan. Pere dendstin, dane hev. Yen ku çarbcen vvan kevn bûn, bi ye nûre guhartin. Çend kesan kirasen nû yen li ser xwe dendstin dane he valen xwenen mayî. Oumandar ku ev hala dît, dilteng bû. Sere poze vvîşevvitî. Dema ku piçûk bû, li dibistane, çiqasîji hevalen xwe hez di kir! Evvana jîji vvî. Peren xweyîmayî parve dikirin di nav hevde. Heval û dost. Paşe her kesek bi alîkîde çûbû. Jiyane hemû, bela belayî ki ribûn. Piştî çend salen direj, edî bi emren zede, bi jin û zar, wexta ku vvan dosten kevn hevdu didîtin, tiştekî germ dile vvîde dinuqutî. Bi sehetan
rûdiniştin û qala rojen bere dikirin. Vî karî, qumandare cendirmetiye, ev tişt hedî hedî, bi dilop û düop helandibû. Bûbû kesekî nû.
Dosten wî yen bere jî, edî germ û bi dilbiratî evv nedipirsiyan.
Niha ku Tendurekiyan di vî halîde dît, vvekî agire bin xuliye, hevaltî, dostî û alîkarîkirin hate bîra vvî. Wekî emîşekî serîn û nîvtirş, zima ne meriya bişevvitîne. Wüo ku tengasiya dile wî piçekî sivik û kem bû.

Evv niha bi dilhezkirî, bi biratî, be vir û derevv nezî hev bûn. Ouman dar, rojen bere, zaroktiya xwe hanî ber çaven xwe. Le bele demekî kurt. Wisa nîşan dida ku awqas hatibû guhartine, le dîsa jî hine tişt di dile vvîde mabûn. Ji bo ve jî, du roj û du şeva gundiyen bene kutane û bi biratî ye hevdû hemez bikin, paşe qumandare rojen bere bîne bîra xwe.
Cima gelo hereket û fikren wî vvüo hatibûn guhartine, xeraw bû bûn? Evv niha vvekî perçe hesinekî makîne bû. Hesin be makîne nedi bû. Ku vvüo nebe, hesine be avetine û vve zenge bigre. Ev makîne li ser hezkirin, dostî, alîkariye nehatiye çekirine. Ji serî heta davviye, ji da vviye heta serî bi heloqanve bi hevdû hatiye giredane. Her tiştî kemasiyek dihanî cî. Peşda çûyin, devvlemend bûn, ciyen bilind li berî her tiştî bûn. Herkesi pe li ser sere yekî din dikir ku hilkişe jore. Ke ku xwe xilas kir, ye jîr evve. Ev makîna, makîneke vviloye. Her tim gotina me riya, xwastina meriya nabe. Wisa naçe. Makîne meriyan diguherîne. Dbce tehrekî dine. Oumandar jî vvisa. Makîne vvüo kiribû ku hesin edî ne hesine bere bû. Dibe ku rojeke wisa nebûya, le îro avvha bû. Le be le tiştekî dine hebû. Ve makîne, meriv diguhartin û dbdstine bi tehre kî dine, gelo meriv nikarin ve mekîne, qet nebe, piçekîjî biguhurînin? Dibe. Dibe. Cima nebe? Ne vvisane cima? Soro û tendurekiyan îro bi biratî li hevdû dibine xwayî û li hemberî her tiştî radivvestin. Dibe ku her" çûyî, mekîne nikaribe tiştekî bike. Bele. Bele. Ya rastî jî eve. Ev bûyeren di jiyana me, bi hevre giredayine. Kem kes vana dibine, ferq dike. Evv jî bi salan, piştî xebat û ceribandine... Bi hiş û aqüekî nû.
230
Gundiyen girtî, rojeke dîsa dereng diman ku herin hember savvcî. Nezîkî nîvro, se cendirme û Fate hatin. Fate deste küre xwe girtibû, jineke pîr û xwarziye Soro Elî jî pere bûn. Ji gund, hespekî jar û pîr je

re dîtibûn. Herdu jin û zarok bi dor le sivvar bûbûn. Elî rede bi cendirmanre
qise û hevaltî kiribû. Jin him vvestiyayî, him jî di meraqede
bû. Kurik ji tirsa, deste xwe havetibû peşa diya xwe. Dema ku hatine
qereqole, kurik sere hespe girt, Elî û jin çûne hundir.
Fate, cara peşîn bû ku diçû daîreke. Emre xwede qereqol nedîtibû.
Le dîsa jî neditirsiya. Li gund, cendirman ku jere qala çûyina vve kiri
bûn:
Ere. Ere. Eze niha rabim herim. We çi bi min bikin? Çî min ji
meran kemtire? Evv merin ji xwere. Ezjîbi jintiya xwe, her tiştî dikarim
bikim got.
Çend jin xemgîn bûn.
Keçe dîne. Beredayî, beredayî xeber nede vvüo. Li nav cendir
man, li qereqolan çi kare te heye? Kî çi zane, vve çi binine sere te? îca
tu dîn û îmana vvan heye, gotibûn.
Dîsa jî telaşa Fate nîn bû.
Gû xwarine. Hela bira yek ji vvan, bi çavekî dine li min binihere.
Xwede tiştekî wisa nişan nede. Te bibînî. Xwîşka te deve çend hevva
tijîxwîn dike. Ye ku deste mede maye, namusa meye. Eme li vve nebi
ne xwayî? Hela em li gund û erde nebûne xwayî, meji dest dendst. Ye
mayî jîji dest here, ere? Xwede neke, got û bersiv dabû vvan.
Wisa digot, le dîsa jî di dile xwede ditirsiya. Li gund qet pirsek nehanîbû
ser xwe. Le li qereqol û daîran? Li ser van deran, gelek goti
nen ne baş bihîstibû. Li qereqole, par gundiyen vvan çiqasî kutabûn?
Evven ku îro ji bajer hatin, di çi halîde bûn? Wekî neçûya? îca vve çi
bikira? Se cendirmen bi çek. Hukumateke bi deng. Li hemberî vvan
bisekiniya? Paşe, penc peçî jî ne yekin. Qet yekî vvanî baş tüne cima?
Evv jî merivin. Lavve de û bavanin. Namusa hemûyan jî heye. Le hu

kumat? Evve namusa me bipareze. Wisa digot di dile xwe de. Le piştî du deqîqan ev tişt difiriyan, diçûn. Dîsa tişten ne baş dihatine ber ça ven vve.
Gundî tevî hev bûn. Hinekan digot ku, bira Fate nece. Devvsa vve, meren mayî herin. Çend kesan jî digot ku, bira mer hemû pere herin. Gotinen be se»-, be binî bûn. Di nav ve qelebalixede dîsa Fate, ji he mûyan jîrtir derket.
231
Eze herim. Çavva necim? Ez necim, îca eze çi bikim? Li hembe rî hukumate bisekinim, ev çiye? Ji bo min, ber xwe nekevin. Xaltiya Zelexa bira bi minre be, beşe.
Küre vve, çav kelogirî, destekî vve girtiye, peşa vve bernade. Diya xwe guhdarî dikir, jerve li rûye vve dinherî. Cîranan gotinen Fate qebûl kirin. Kare male û her tişt ji jinen Mîro û Sorore got. Çavva hebe, vve sibe anjî du siba vegeriya. Wilo difikirî. Qet tiştekî dine nedihate hişe kesî. Sibe zû, cîranekî, hespe xwe jere hanî. Hespekîjar û pîr bû. Dîsa jî lingen vvan ji erde xüas dikir. Ev jî besî vvan bû. Eli jî hazir bû. Eze jî bi tere beme, xwenga Fate.
Na. Na. Te beyî çi? Ne pevvîste. Cima em diçine ku? Eme zûti re bizivirin. Tu neye. Tu li mal û kare cîrana miqat be.
Na vvalle, eze bem. Tu bibejîjî, nebejîjîeze bem.
Cîranan jî got, «bira be, bira be, xorte, çi dibe, bira be...» Evv jî te vî vvan bû. Fate xatire xwe xwast, küre vveyî mezin li mal dima. Evva hemez kir. Rû û çaven vvî, bi deng maç kir. Ji çaven levvîk, zûve dilop dihatine xware.
Xaltiya Zelexa û Fate, di rede, virde vvede, ji yen bûyî, yen bere xeberdan. Li Tendureke, xaltiya Zelexa şirîke derde hemûyan bû. Za ren gund gişt di deste vvede hatibûne dine. Bi ken û henek bû, nedigot

eva jine an jî mere. Bi hemûyanre xeber dida, henek dikir. Kin û qemer bû. Wisa dbcuya ku di civantiya xwede bedevv bû. Yen ku serî, dil û dereka vvan bieşe, direviyan ba vve. Yen ku heyvvanen vvan nexvveş bikevin, jî dîsa vvisa. Zimane vve serîn, meriya bi xeberdanen vve bîr û bavver dikir. Yen ku ji hev dbceyidiyan, dilsar dibûn, vve li hev dihanî. Levvra, berî her kesî, li gund çibûye, çi nebûye, vve dibihîst.
Nezîkiya nîvro, dema ku hatine bajer, edî tiştekî vvan ye xeberdane nemabû. Bajar ji günde vvan pir mezintir bû. Xaniyen bilind, mînara camiye hüdikişane ezmanan. Şaş û metel li van tişten nû diniherîn. Kü re vve bi tüyen xwe, hine cî nîşan dida û dipirsiya. He zanibû ku diya vvî ji wî betir zane.
Fate û xaltiya Zelexa, birine oda qumandar. Evv jî li benda vvan bû. Hûn hatin?
Ji gotinen vvî, pirsen vvî, herdu jina jî tiştek fem nedikirin. Nezan, nezan li rûye hevdu meze dikirin. Oumandar û meren gund, karibûn bi hevre bipeyivin. Le bi van herdû pîrekanve nedibû. Oumandar ga zî Zeynel kir. Zeynel cendirmekî ji Zaraye bû.
Küre min ji vanre beje. Ez texmîn dikim ku eva civvan Fateye?
232
Zeynel ji vvan pirsî û zivirî bersiva qumandar da. Bele qumandare min, evvaye.
Di birîndarkirina Maruf, par şevvitandina traktöre, dibejin ku evveya gund berî van karan daye. «Hûn çito merivin, bi axakîre serederiye
nakin?» gotiye. Gund berî hev daye. Cima vvüo kiriye? Hela je bipirse.
Oedereke li heviya vvan ma. Zeynel ji Fate pirsî. Fate bi dest û ini len xwe tiştna dibeje, dipeyive.

Vir, derevvin. Ez jinebiyekim. Çi dikarim meran bere axe dim.
Ez kîme cima? Kî gura min dike? Ke gotiye ev gotinan? Bira be, ca reke jî li ba min beje. Derevvin. Derevv. Axa hat li ser erde me rûnişt. Mere min li çol û baniyande, da kuştine. Ez û etîmen min be bav hi ştin. Zeviyen me jî tera wî nekirin. Paşe, zeviya devvsa dibistana gund jî ajotin. Gundiyan jî lexistin. Çi sûce min heye?
Le te gotiye ku, «hûn bi axakîre nikarin serederiye bikin». Ev çi ye le? Tu dibejî, min kes berî axe neda.
Bele min got. Merivek li ser gundekî rûniştiye, hûn hemû gundek pe nakin, min eva got. Min negot ku, «herin lexin, bikujin». Sûc kîdera van pirsandeye? Ere?
Dema ku li Maruf xistin, tu jî li vvedere bûyî?
Bele, li vvir bûm.
Tu li vvir çi digeriyayî? Nav meranda?
Ez ne tene bûm. Jinen din jî hebûn. Jin, mer, zar hemû li vvir bûn.
Te jî bi dar û keviran lexist?
Bele. Ne bi daran, le, min jî kevir havetine. Leket an leneket, ni zanim.
Çavva nizanî? Meriv çavva nizane ku keviren havetî leketin an na?
Gelekan kevir dihavetin. hinek le diketin, hinek jî vala diçûn. Ez çi zanim ku keviren min an ye hineken din lediketin?
Oumandar îro bedeng bû. Cane wî ji duh siviktir bû. Fate jî di nav yen ku li Maruf xistîde bû. Xwe bi xwe digote. Her tişt edî hazir bûn. Wek xwestina qumandar qise kiribû.
Le tu dibejî ku jinen din jî hebûn li cem te û kevir davetin. Na ve vvan beje, heke vvisane.
Fate fikirî. We çend nav bigotana, paşe hate bîra vve ku ev tiştekî

ne başe. Li gund, her tim ne baş xeber didan ji bo yen avvha. Çavva vve naven vvan jinan bigota?
233
Ez çizanim kî bûn? Gelek hebûn. Le nizanim ke, ke bûn. Tu
jineke bi sal û bi aqüî. Tu ne zarî. Li cem te bûn. Dibe ku hûn tev çûn
vvir. Keviran davejin. Niha jî tu nizanî, evv kî bûn.
Nizanim.
Rind bifikire. Paşe ji bo te baş nabe.
Hûn hukumatin. Hukumeteke mezin. Cima ji min dipirsin, naven
vvan? Hûn min bikujin jî ez nabejim.
Oumandar xwestibû ku ya rastî hîn bibe, levvra dipirsiya. Xwejî nedbcvvvvest
ku jina tevî van karan bike.
Gotinen vve hanî bi ser hev, hinek jî xwe pede kir. Peçiya Fate da
lexistine. Kare wî qediya bû edî. Gotinen vvan û güîkirina axe hildan,
çû cem savvcî. Savvcî jî bi hale birîndar hesiyabû. Rapora peşîn îro an
jî sibe, vve bihata. Xetera mirine pir bû, nexweş li ber mirine bû.
Savvcî li gotinen vvan meze kir, dît ku hemû vvek hev dibejin. Gişt jî
hetanî davviye, di nav bûyerede bûn. Bele, heke ku tede şaşî tunebe,
vvisa nişan dide. Giştan jî eva suca kiriye. Eðer bi zorbetiye vvüo negotibin,
gişt jî sûce xwe qebûl dikin. Qet yek jî poşman nîn bû. Di nav
vvande, jinek jî hebû. Evv jî vvek yen dine dibeje. Raste rast gotiye ku
evv jî di nav vvande bûye. Hevde mer, yek jî jin, heyjde kes. Awqas kes
gerek ku bihatana girtine. Gelek bûn. Gelo meriya nikaribû ku hine
kî kem bike? Gelo gişta jî vvüo, mîna hev xeber dabûn? Dibe ku bi vî
tehrî, bi vvan dabûne mor kirine, nav nîşan kirine? Xwe xwest ku ca
reke jî vvan guhdarî bike û ji vvan bipirse.

Piştî nîv sehete, li hember savvcî bûn. Xenji nivîsdare wî kes li ode tunebû. Dît ku mîna bere, vvek hev dipeyivin. Xwe jî şaş û metel ma. Gotinen zede ji dev dernediketin. Di nav toz û xulyede bûn. Ruyen vvan direj bûbûn. Dest, ruyen hinekande birîn û vverimandin dihate xuyane. Savvcî zanibû ku ev du rojin li qereqole hatine kutane. Levvra ji wî alîde qet tiştek nepirsî ji vvan. Wisa bavver dikir ku gerek hinek ti ştan nebîne û nebihîse. Bi tehrekî dine nedibû. Axatî û seren li ser erda, li vî alî, ji vvîlayeten dine zedetir bûn. Le vvüo difikirî ku kes nikare ve biguhurîne û li hember derkeve. Ji taqeta vvan zedetir bû. Xwe jî ji axatiye diqehirî. Jiyana memûrtiyede rind fem kiribû. Eva mîna marekî bi heft seriye. Meriv pe nikare.

Gotinen Soro ku guhdarî kir, te gihîşt ku evva gelekî hatiye kutane. Bin çaven wî reş, vverimî, poz sor û birîndar, ruye wî tev birîn û qalik girtibûn. Peçiya vvîpeçandîbû. Soro jîgotina xwe duçar kir. Çend pirs di derheqe axande got. Çavva bû, savvcî tev pirsen wî bû.

234

Ev axatî cima, ye pirî li ba vve heye? We gundiyan, evv anîne vve dere. Weji vvanre xulamî kiriye. We evv bilind kirine. Niha hukumat jî pe nikare edî. Li ale me jî axayen zorbe hene, le ne vvekî vir.

Soro li ser piyan, gotinen savvcî, heta davviye guhdarî kir. Dibe ku bi dil û be mene digot. Paşe:

Le bele savvciye min. Tu dibejî ku hukumat bi van nikare. Hu kumat kiye cima? Savvciye, hakime, qaymeqame, qumandare. Ne vvi sane? Memur û cendirmen hukumate hene. Te got ku vve xulamî kiri ye, aniye ve dere, vve evv bilind kirine. Wekî vvisane bege min, me bi kefa dile xwe cima avvha kiriye? Cima ke can, namus, zevî û kar, bare xwe li erde dîtiye? Em jî ji bo vvan dijîn, ne vvisane? Le bele ya rastî, hukumat yale van axan digire. Qaymeqam te, li malen vvan dibe me

van, ne malen me. Savvcî û hakim ten li malen vvan, benca dbcvvin. Qet silaveke jî nedine me. Wüo ku dibe, em feqîren xwede çi bikin? Be ça re diminin. Ji vvanre xizmete nekin, îca çi bikin? Kîbi desten me digi re? Binher, ev du şalin, çi nehate sere me? Paşe çi bû?
Soro bi dil nexwestî, birîn û vverima rûye xwe pe nîşan da. Deste xwe direjî peş wî kir.
Davviyede ez ketime vî halî. Oedera me vviloye.
Savvcî edî nikaribû direj bike. Xwe da ser kare xwe. Hemû guhda rî kir. Paşe dora Fate hat. Yekî vegerande tirkî. Le dîsa jî ke lexistibû, Maruf anîbû ber mirine, nedihate xuyane. tiştekî dine ku bihata kiri ne, tunebû. We hemû bida girtine.
Xaltiya Zelexa, Fate û küre vve, di salonede digiriyan, dizariyan. Memûren daîran û hine gundiyen dine, bi dibcemgîn li vvan meze di kirin. Bi zore evv ji hev qetandin. Fate vvüo bi hesret küre xwe hemez dikir ku... Zelexaye evv bi zore ji diya wî dûr xist. Hevde mer û li dû vvan, Fate, di nav cendirmande sûka bajer tijî kiribûn. Evvana, bi ber ve girtîgehe dibirin. Kesen li dikanen sûke, li kuçan qelebalixeke gi ran li vvan meze dikirin. Li pey vvan, zarekî kurîn, sere jer digiriya û diqîriya. Dora pore wî jekirî, poliken bi rengin û morî li ser namilan xemüandî, rû qemer û xweşik bû lavvik.
Daye... Daye...
Wexta ku denge wî vvüo dihat, di nava sûkede bûn. Fate li ser den ge küre xwe zivirî. Tiştekî germ niqutî dile vve. Kezevva vve dişevvitî. Ji cîranen xwe, cendirman û qelebalixe fedî kir. Di emre xwede awqas kes nedîtibû. Di ciye xwede sekinî. Du gav şûnve avet. Küre vve xwe havete hemeza vve. Bi peşa xwe, çaven wî zuha kir. Deste wî girt û te-
235
vî hevalen xwe bû. Hemû li ser denge lavvik, hedî diçûn niha. Girtî, bû

ne nozde kes niha. Yek jî girtîkî bi xwe, bi dile xwe bû. _
Vî halî gelek kesan düşevvitî kir, xenji çend dosten Ûsiv axa. Düe hemûyande, ji bo van kesan, pir an hindik şevvat hebû ana. We roje di bajerde, ji bo tendurekiyan, Ûsiv axa, küre wî û qumandar gelek tişt hatine xeberdane. Her kesî heq didane hinekan. Yen ku digotin, ten dûrekî bi heqin, ne kem bûn.
-XXXIIIEv
hefteyeke ku li girtîgehede bûn. Sereke gardiyanan Soro, Mîro û Seîd nas kir. Bere jî, gelek dostî nişanî vvan dabû. Ji gund nivîn û ti şten vvan hatibûn. Li gund, cîranen vvan karen yen ku girtîgehedene, hildane ser müen xwe. Li zeviyen vvan miqate dibûn. Ji gund savar, pe ner, nîsk û rûn anîbûn. Ji hemû malan xwarin berhev kiribûn. Nediha te bîra kesî ku kur, bira, kesekî nezî vvan girtiye, ji vvanre diçe. Bi xurc û terada, tevî hev şandibûn. Gundiya fem dikir ku hemûya tevayî li kü re axe xistibûn. Le bele li ber vvanve hinek gundiyen vvan, niha hatibûne girtine. Levvra giştan jî kar û male cîranen xwe diniherîn, kemasî dihanîne cî. Her betir nezî hev bûbûn. Kemasiyen yen çûyî, nedbcvvas tin ku nîşanî jin û zaren vvan bidin. Bi vî tehrî kar, bi reve diçû.
Xaltiya Zelexa, bi küre Fate ye mezinve, li mala vve dima. Mala vve ji bere rindtir, bi rezeke baş bû. Girtiya vvüo dibihîstin. Qet Ûsiv axa nedîtibûn. Nobedar Şukrî, Eso û Hesene Hemzo car caran diçûn ma la axe û cem gundiyan. Wan xeber dihanîn. Küre axe, Maruf her diçû baş dibû. Zimane wî giran bûbû, nikaribû vvekî bere xeber bide, digo tin yen hatî.
Fate li ale girtîgeha jinan bû. Nezî ya meran, du ode bû, evv dera. Maleka nû çekirîbû ku kire kiribûn: Xenji du odan, odeke ser û kincşûştine hebû. Ciye avdese û aşxane jî baş bû. Bi tel û hesinan hevvîrdora vve girtibûn. Li derî telan, ciye nobedar hebû ku ji daran hatibû

çekirine. Gelek caran nobedar diçû li cem hevalen xwenen girtîgeha meran, levvra, jin be nobedar diman.
236
Dema ku evv hatin, li ale jinan, se girtî hebûn. Rojen peşîn, hela he, gelekî nezî hev nebûbûn. Fate çend roja, sere xwe bilind nedikir, di giriya. Küre vve li gund mabû. Hertim li peş çaven vve bû. Le, vvekî li gund nexweş bikeve, kes le nenihere? Ji tenebûne bitirse lavvik. Küre vveyî piçûk, ev der hez dikir. Baxçe, elektrik û ciye avdese, ji bo vvî, ti şten nû bûn. Diya wî ku digiriya, li peş çöken vve rûdinişt, bi desten xwenen piçûk hesiren çaven diya xwe zuha dikir û desten vve miz di da. Diya wî dest ji girî berdida. Evv dida hemeza xwe, bi çend pirsen dibcvveşî evv şa dikir. Zike wî ter dikir, xwe jî bi vvîre hine nane tisî dbc vvar.
Careke her se girtî, bi hevre, ji bo küre Fate dûr û direj giriyan. Yen kuji gund dihatin, xeber dihanîn ku küre vve qet diya xwe nagere û pir başe. Paşe hedî hedî Fate jî vvekî bere bû. Gundiyen vve pirs dane ku careka dine, hevdîtinede vve küre vve jî bînin.
Fate hînî herdu hevalen xwe dibû, ji hevdû hez dikirin edî. Xwarin tev çedikirin, dbcvvarin. Lavvik dişandin, ji vvan piştan dar dihanîn. Kin cen xwe dişûştin. Emre xwede qet rojeke, vvüo rehet û bi dile xwe, se re xwe neşûştibûn, vvekî vira. Seyîtxane piçûk, vira, mînanî li mala xwene kefxweş bû. Diçû, dihat bi qurne ave dileyst. Li vir mijûliya hersekan jî Seyîtxan bû. Nedîtibû bere. Ourne li alîkî dizivirand û ava zelal dikire şire şir. Ter, ter şa dibû. Dest û rûye xwe şil dikir, bi ave dileyst. Her se, bi Seyîtxanve duşa dibûn, sebra vvan dihat û ji wî hez dikirin. Delaliye vvan bû. Li gund jî wisa bû, le li vir her zede. Diçû baxçe, ne zî ciye nobedar dibû. Ji dûrve li tivinga wî meze dikir û bi sehetan ji mezekirine nedivvestiya. Eşqa wî bi hesine tûjî sere tivinge û qawişa

ku meriv daveje hustiye xwe dihat. «Xwazüa eva ya min bibiya», digot di dile xwe de.
Rojekeji cendirmanre gotin, Seyitxanjîbixwere birin girtîgaha me ran. Seyîtxan ji bo ku gotinen diya xwe bigîhîne cîranan, çûbû vvir. Dbc vvast ku kincen vvan, ji bo şûştine bibe cem diya xwe. Giştan Seyîtxan ji dest hev digirtin, hez dikirin. Yekî şekir kire berîka vvî. Girtîkî şehkî reş da vvî. Dema ku bi rev û lez şûnve dihat, şehe xwe hişke hişk, di deste xwede digirt. Cîranan kincen xwe, bi xwe dişûştin, levvra ji Fatere neşandin. Ji bo diya vvî, hinek pere kirine berîka vvî. Him Soro him jî sereke gardiyanan, evvî serrût û rûken, ji cendirmere gotin ku bira li Seyîtxan miqatebe. Soro deste wî girt û her dere gerand. Wexta ku evv şande cem diya vvî, pere teme kir ku bira car cara, bi nezîkiya nîvro te ne be. Ji baxçe gazî bike, «ape Soro», paşe vvere hundir. Seyîtxan ti-
237
ştek fem nedikir ji van gotinen Soro. Dîsa jî sere xwe hejand, qebûl kir.
Seyîtxan edî bi hesan diçû û dihat. Roja peşîn ku gotinen Soro ji di ya xwere got, evv tegihîşt ku Soro cima vver gotiye.
Raste. Rast gotiye Soro, küre min. Nece cem kesen ku tu nasnakî.
Bi vvanre qise meke. Evv ne gundiyen mene. Ji minre negotî, nece cîkî, lavve minî delal, got Fate.
Niha di destekî Seyîtxande şeh û di deste dinede neynikeke şikes tî, her tim pore xwe şeh dike. Nece dibe, paşe xirab dike û dîsa şeh di ke. Niha mînanî maleke dijiyan evv her çar. Se jin û mere male Seyîtxan. Li cem diya xwe ravvestandina Seyîtxan jîbûyereka dine. Serok gar diyan deng nedikir, tiştek nedigot. Dile wî bi vvan dişevvitî. Gerek nivîsdare
girtîgehe li van karan binheriya, teselî bikira. Le bele evv avvqasî

tevî her karî nedibû. Evvî, tene, rojen xwe derbas dikir.
Li ale jinan, gardiyana vvan «Xaltiya Cevvahir» bû. Gelekî qelew, rûye vve sor, xaleke reşe mezin li feza alîkî biriye vve hebû. Mala vve, çend mal ji dûrî girtîgehe bû. Le dîsa jî, dema ku dihate kare xwe, di nav xuhyede dima. Wekî qazan reve diçû. Bîhntengî pere hebû. Di de ve xwere bîhn distand. Laşe vveye bi goşt düerizî. Tansiyona vve bilind bû. Tişten qelandî û xwe xwarin jere ne baş bû. Le bele kesekî deve Cevvahire vala nedidît. Wexta ku jere digotin, gerek kem bbcvve, jar bi be:
Ez qet tiştekî nexwim jî, kok dibim. Çi bbcvvim li min te. Hemû kes dibinin. Ez tu tiştekî zede naxwim, digot û diqehirî.
Dema ku ji male dihat, nîv sehete bîhna xwe distand. Dikire ofînî, pofînî. Way pişta min, vvay çoke min dieşin, digot her tim. Wan her se girtiyan, kare Cevvahire gişt dikirin, levvra vve deste xwe nediavete ti ştekî.
Evv rojen peşîn ku Fate zû zû digiriya, qediyan. Ana jî vve Esmere dest pe kirin. Bere jî her tim digiriya, le waxta ku Fate nû hat, vve derden xwe qaseke ji bîr kir. Niha dîsa digiriya. Ve çare jî Fate dile vve distand, li ber digeriya û nedihîşt bigrî. Kulen Esmere dîsa serî hildabûn. Diya vve li gund bû, dihate bîre. Ji davviya xwe ditirsiya.
Bi gotinan, dibe ku paşe vve bişînine vvîlayete, mehkema giran. Ji günden deste, dest û piyen vve gir, nexweşî nedîtiye, yeka sor qemere Esmer. Wexta ku dest bi girî dikir, bi sehetan dikişand giriyen vve. He tanî evare, parîk nan nedikire deve xwe. Le heke ku vve roje bi kefbe, henek û laqirdî dikir, di nava kare xwede kilam digotin bi pere. Den-
238
ge vve mînanî zengilan û dile meriya dikizkizand. Zareke de û bave xwe tene bû. Nîve gund ye vvan û nîve din jî ye ape vve bûye. Malen

vvan li cem hev. Herdû bira, bi hevre pir xweş derbasiye dikin. Qet tu cara, dile hev neşikenandine. Şer nekirine. Jiyana hemûyan bi dilen vvan. Ap, piçûke bave vve ye. Ji gura biraye xwenî mezin dernakeve. Oedre hev zanin, hürmet dikin. Tu xwîşk û biraye Esmere nebûne. Birakî vve bûye, le şeş salî, beriya vve miriye. Paşe ji nexwaşiye, an jî çimaye kes nizane, le diya vve edî zar nehanîne. Kî çi dibeje bira beje, diya vve bavver nedikir. îna dikir ku li ser nivişten nexwazan, ji zaran bûye. Tu şex û mele li vvan deran nehiştibû. Çû ber deren hemûyan, le dîsa jî zare vve nedibûn. Esmer ku qala bûyera xwe dikir:
Ax, vvekî birayekî min hebûya, tu ev dihatin sere min. Wax ez serreşe. Wax ez bextreşe. Bira hema tene mer buya. Hale bira, tiştekî dineye. Ax, ax bira, digot û digiriya.
Xwedeyo, te cima ruhe biraye min sitand? Bo ku min li ve dine, peş hemû kesan rezîl bikî, perişan bikî, ere? Le diya mine belengaz? Evv niha di çi halîdeye?
Bave vve rojeke nexweş dikeve. Cîran dibejin ku serma girtiye, ne tu tişte. Dane xuhdane. Qedeh havetine pişta vvî. Nava rojekede giran dibe nexweşî. Qet tiştek ji deste kesî nehatî, berbanga sibe dimre. Bi rojan, bi ev mirina nişkeve hatî, bavver nekirine. Diya vve, demeke di rej nehatiye ser hişe xwe. Nişkeve tene maye. Giraniya male ketiye ser milen vve. Feqîre bere jî jar û zirav bû, le niha vvekî pepûkan qet nemaye. Mala ape xweve vvekî maleke bûne. Çend meh derbas bûne, edî hedî hedî tunebûna bave vvekî bere giran nehatiye. Kare male, merg û zevî bi re çûne.
Qîzik edî xama bû. Di jiyana bave vvede, çend kesan je xwastibûn. Le bave nedbcvvast keça xwe wisa zû zû bide û ji xwe dûr bbce. Saleke bere, bave vve ku mir, evv hevde salî bû. Li vvan deran, qîzeke bi nav û deng, bedevv bû. Ji maleke devvlemend, zareke maleye tene. De û ba

ve vve evv delalî hîn kiribûn. Le dîsa jî diya vve her tişt hînî vve kiribû. Tişten ku ji deste Esmere nehatana tunebûn. Gelekî zû hînî tiştan di bû. Desten vve mezin bûn. Ku bi dest karekî dikir, meran nikaribûn pere serederiye bikin. Bi van desten gir, tişten vvüo zirav dikir ku me riv şaş û metel diman. Mînanî hineken dine ne bi derde xwede, bedeng û be hereket bû. Gotin û xwastine xwe bi de û bave xwere xeber dida, digot. Renge pûşiya sere xwe, dere xwe, xwe dijibart. Digot ku ev heqe vveye. Le qîz û büken gund ne wisa bûn, ya rastî. Meran çi bikira,
239
vvan bedeng qebûl dikirin. Bave vve ku mir, nîve gundji Esmerere ma bû.
Küre ape vve, ji vve çar salan piçûk bû. Esmer di piçûktiya vvîde je hez dikir, alîkarî dikir. Wekî xwîşkeke mezin. Lavvik pir nexweşî kişan dibû. Levvra çilmisî û gevvrik bû. Carekejî herd çöken wî vverimîn, sor bûn. Di hemezande dibir û dihanîn. Ber eşan, qîrîniya wî diçû ezmanan. Esmer him ji wî gelekî mezin û him jî nexweşî çiye, nizanibû. Car cara jere tiştekî gotine didît, dile vve pe dişevvitî. Te digot ku ev derden lavvik ne bes bûn, paşe li gûziken linge vvîde birîn derketin. Qet nedihatine xitimandine. Bi mehan kem je dihatin. Ji hestiyen wî tene, digotin. Çend caran birine ser doxtiran, birîn hatine girtine. Pismame vveyî çilmisî pak bû le dîsa jî dest, pî û rûye wî spîçüokîn bûn. Bi goşt û reng nîn bûn. Bi kesîre nedipeyivî, dûr direviya. Ji Esmerere 'xwaha Ese' digot, her tim. Ji male, giştan zedetir ji xwaha Ese hez dikir. Na va vvande çar sal hebûn le dîsa jî Esere hurmeteke mezin nişan dida. Piştî saleke, ape vve ne mînanî bere bû. Bi tehrekî din vve û diya vve meze dikir. Ape nedbcvvast ku ev qîza bedevv û nîve gund, pere here yekî dine. Esmer li peş çaven xwe didît, awqasjîr û xweşik... Nîve gund, zeviyen herî baş ji hişe wî dernediketin. Her diçû dile wî dieşiya li ser

van. Ji Esmere baştir bûk bi dest nediket. Him jî nîve gund ku perebe. We baştir her evve.
Bere bi zimanekî serîn ji diya vvere gotin.
Heke ku here yekî nenas, yekî be şîr û be töre bike? Heyfa keçike.
Te vve çaxe, her betir ber xwe bikevî, düşikestî bibî, gotin.
Jin û mer bi roj û şev diya vvere ev qalan dikirin edî.
Ez devvsa bave vve me. Evv keça mine jî. Ez namus û heya bira ye xwe, vvüo be xwayî nikarim bihelim. Paşe xelqe ji minre çi beje? Xwastin ku diya vve, bi vvan bavver bike. Le diya vve xisyet û edeta vve rind nas dikir. Dejî, qîz jî evv lavvike tifal vvekî küre xwe, biraye xwe zanibûn û vvüo qebûl dikirin. Zavatiya vî feqîrî nedikete hişe vvan. Tiştek ji deste min naye. Keçik vvaye li vviraye. Herin ji vvere be jin.
Tu çavva wisa dibejî? Tu ne diya vveyî? Ez ap û tu diya vve. Ku me qebûl kir, çi heqe vve heye? Evve çi beje? Ke dîtiye ku meriv kare avvha, ji keçan dipirse?
Bele, ya rastî jî vvisane. Le hûn zanin ku bave vve çilo evv mezin kir. Bi çi tehrî da gihîştine, terbiye û töre kirine. Heke ku Esmer bi xwe qebûl neke, bi dile vve nebe, hişe min vî karî hünade, ya rastî.
240
Diya vve jî zanibû ku ev tişta, karen meriven bi aqü nîn bû. VVekî ti ştekî bi xeyal bû. Jin ap û diya vve kuji Esmerere gotin, te digot ku der zî tere kirine. VVüo weciniqî.
Cima hûn dîn bûne? Evv biraye minî piçûke. We eva kara ji ku dendst? Careka din jî vî karî hünedin ser zimane xwe, got û ji vvan dûrket. Nedbcvvast edî pismame xwe bibîne û li rûye wî binihere. Kurape vve jî her tişt ferq dikir. Dema ku dihatine cem hev, ser xwe di ber xwede xar dikir. «Bavver bike ku, vana ez nabejim. Xwastina vvan bi xweye.

Ezjî te rind fem dikim xwenga Esmere» dbcvvast beje, bi çavan.
Ape vve dest ji vî karî venedikişand. Caran bi dibcvveşî, caran bi çavtirsandî
dihanî bîra jinbira xwe. Dbcvvast ku her tişt bi dile wî bibe.
Kînge yek ji vvan dest bi van pirsan dikir, Esmere pirsen vvan di de
ven vvande dbcitimand û hertim li hember derdiket. Roj û meh ku der
bas bûn, li her dere dihate xeberdane ku Esmere didine pismame vve.
Esmere fem dikir ku mînanî tora pîrhevotke her çar aliye vve hatine
girtine û her diçe jî teng dibe. We çi bikira? Diya vve ya feqîr ne jineke
vvisaye ku bi sere xwe qerar bide û li hemberî ve xwastine bisekine.
Bi keça xweve ku tene dima, evv hez û hemez dikir. Bi çaven xwenen
hesir, vve jî digot ku evv jî be dile, mînanî keça xwe. Tiştek ji dest nedihat.
Xwe tene û bekes didît. Evv Esmera bere ya bi ken û rûgeş çû,
devvsa vve yeka bi rûpirçî hat. Te digot ku dbcvvaze bi hinekanre şer bi
ke. Wekî bere xwarin û xemla xwe nediniherî. Dbcvvast ku hema usa li
malbe û ter bigrî. Amojina vve pe dişevvitî. Ji mere xwere digot ku bi
ra dest ji vî karî berde. Him jî çend cara got.
Hûn jin çi fem dikin? Ev qîza dînik û be töre, vve ji küre min ba
ştir mer bibîne, tu dibejî? Ez nahelim yekî nenas, bîjekî pexwas be tekeve
biçenga min. We fem kir? Virde, vvede nizanim. Gotina min ge
rek be cî, digot û jina xwe por poşman dikir.
Esmer digiriya, deste xwe nedida tiştekî. Her diçû spîçüok û zer di
bû. Gundî jî edî, hedî hedî her tişt dibihîst. Paşe her çû, ev xeber çûn
ber guhe kesen ji günden dine. Esmere nexwar û ne vexwar. Wisa bû
ku davviyede kete nav nivînan. Ape wî jî her diçû zede diqehirî, dike
te înade. Zavaye belengaz, nedbcvvast ku ber rûye xelqe keve. Her tişt
ji rûye vvîde hatibûne vî halî. Levvra, gelekî şerm dikir. Li nava gund
de xwe bi xwe piçûk didît. Wüo zanibû ku hemû kes dijî vvîne, bi ça

ven neyarî li wî diniherin. Qet tu kesîre nedipeyiviya edî. Kesî rûçike vvî nedidît.

241

Esmere çend caran xwast ku xwe bikuje. Le nikaribû, bîne cî. Dest ji jiyane kişandin wisa ne hesa bû. Nikaribû her tiştî bide ber çaven xwe. Nedihate vve dere. Dev je berdida. Mala ape û diya vve jî bi van dînitiyen vve hesiyabûn. Rehetî û qenciya kesî tunebû edî. Pismame vve di bin vî barî girande le bû bifetisiya. Nikaribû li ruye kesî binihere. Careke duda xwast ku ji bave xwere beje, naxwaze bi Esmerere bizevvice. Kire büde bild û bave xwe serwaxt nekir. Tifalekî çardeh sah, nexweş û hela he rû derneketî, girya û ji cem bave xwe dûrket.

Ji vve roje şûnve, kire hişe xwe ku xwe bikuje. Bave wî debanca xwe hertim bi xwere digerand. Şeve jî dikire bin balgiya xwe. Gelekî li pey ket, le bele pere seredarî nekir. Debanca ape vvî, di qutiya amojina vvî de bû. Car caran bi tele tel, dizîkave diçû mala ape xwe. Qutiya amo jina xwe teselî dikir. Dibe ku derî vekirî hiştine anjî mifte li ser bîr ki rine digot di dile xwe de. Le diniherî ku Esmer ne li mal buya, diçû li sere isterî jorîn. Qutî li vvir bû. Dere vve dihejand, mifte digeriya. Le her çare jî bi dilsar vedigeriya male. Ciye decance rind zanibû. Çend cara dîtibû ku amojina vvî, debance, sehet û qalûna mere xwe di quncikekî

qutiyede baş dihebîne.

Dîsa vvüo kete hundir. Ve çare, mifte li ser qutiye disekinî. Deste xwe direj kir, bin qutiye, evv hesine sar û meriya düerizîne bi qüifeve hilda. Kire paşila xwe. Zû zû ji mal derket. Nişkeve diya wî derkete peşiye. Bi lezkirina küre xwe, diya wî le kete şike.

Çiye lavve min? Tu ne bekefî îro? Je pirsî diya vvî. Le lavvik li pist xwe venegeriya, dûr ket.

Na daye. Tiştekî min tüne. Ez başim.
Rojtira dine ap, jinap û diya vve li peş male bûn. Birîna pişta hespe derman dikirin. Toye sîrkirî li birîne didan. Esmer çû hundir ku serîk dudu sîren dine bîne. Pismame vve, dere ode girtî, ji sibe virde, care ke tene hatibû xuyane. Ape vve, hinek sîr dîsa ku xwast, Esmer ji bo vve revî çû hundir. Ji ber dere ödere derbas dibû ku gurrînîk hat. Wekî ku xanî hurdişiya. Bi qîrînî şûnve zivirî. Derî vekir. Kurape vve, deveriya vvelgeriyayî bû. Debance jî metrok ji wî dûr bû. Desten xwe bi rin ber çaven xwe. Nikaribû le binihere.
Cemal mir. Cemal mir.
Ku wisa qîriya, ape vve û yen dine jî hatibûne hundir. Li ber dere ode Esmer ji xwe çûbû. Cemal li ode, serî bela belabûyî, li erde xwîn û mejiye wî dîtin. Ape vve, mejiye küre xwe li erde û li cem jî debance ku dît, li Esmere zivirî.
Oehpike. Te evv kuşt, got û evv da ber pîhnan.
242
Amojina vve tiştekî baqü kir, qirme hilda, kire biçenga xwe. Ape vve, vve sibe, debanca xwe din bin balîfede ji bîr kiribû. Ne li cem bû. Li biraziya xweya xweve çûyî dbdst. Amojin û diya vve, bi tirs û şaşbûne le nebûne xwayî. Denge xwe nekirin. Ape vve deste xwe bire ser de banca xwe, debance li cî nîn bû. Bû vvekî dîna. VVe li Esmere xista, bikuşta.
Esmera belengaz. Her tişt, ji ser heta bin, xirab çûn. Cendirme ha tin. Bi debanca bave vve hatibû kuştine Cemal. Debance di qutiyede dihate veşartine. Xenji Esmere jî kes neçûbû hundir. Şik û şipe gişt li ser Esmere kom dibûn. Xenji jinap û diya vve, hemû kesan bavver di kir ku Esmere Cemal kuştiye. Amojina vve li Esmere diniherî û digi riya. Dbcvvast ku hinek tiştan beje, le nedibû. Esmer digiriya û li çöken

xwe dbdst.
Welle, haya min je tüne. Ez be guneme, digot û xwe li vî yalî, li vvî yalî dbdst. Çend cara xweve çû. Niha jî di girtîgeha bajerde bû. Ape, diya vve neeşandibû. Her hefte, dayika feqîr dihate dîtina vve. Qet nemabû tifale. Wisa piçûk bûbû, vvekî lepekî. Li ser vî karîre du meh derbas bûn, le bele tu tîrja heviyeke qet nedihate xuyane. Ape vve, ji bere pirtir, niha jere dijminatî dikir. Bi vî emre xwenî civvan vve di girtîgehande biriziya. Ev ku dihatine bîra vve, hesir ji çavan dibarî xare.
Ji min bavver bikin. Dibe ku hûn jî bavveriya xwe bi min naynin. Qet, qet haya min je tunebû. Heke ku min bizanibûya ku vve vvüo bi ke, mine evv bistande. Bi vvîre zevvac qebûl bikira. Mine bigota, çi bi kim, qedera min vvehaye. Tiştekî dine heye ku hişe min hünade. De banca bave min li cem wî çi digeriya? Ke dabû vvî? Qirme, ji ku bi dest xistibû?
Dema ku digot û dihate ve dere, li rûye yen dora xwe diniherî. Di fikirî, dibe ku bavver nekin.
Careke gazî kiribûn, je pirsiyabûn. Le peyre tu deng je dernediket. Meriven herdu malan, dîtina xwe ji savvcîre gotibûn. Tu kesî nikaribû beje ku Esmere pismame xwe kuştiye. Le ape vve, biraziya xwe gunehkar dikir û heye, tüne Esmere kuştiye digot.
Gardiyan, xaltiya Cevvahîr didît ku evv digirî:
Le le, keçika dînik. Cima digirî? Ev rojan gişt vve bibuhurin. Te bibînî. Xvvede vve derîkî xere veke. Keça min negrî. Tu zanî tansiyona min zedeye. Düşevvat li min naye. Wisa meke. Rabe, rabe. Here ruye xwe bişo. Ne heyfa çaven teye? Keça mina delal.
243
Wexten dine, tev rûdiniştin, tivdarege xurege xwe dikirin. Kînge ca

ne vvan bbcvvasta, çend pompe ledbdstin û ava çaye didane ser kuçike nifte.
-XXXIVLi
girtîgaha meran, deh tendûrekî li qowîşeke mezin û hefte din jî yeka dinde bûn. Hemû der tijîne. Girtiya pişta xwe sipartine hev û he ma hema di hemeza hevde radizan. Mîro û Soro li ba hevin. Seîd, Ta hir û Osman bi çar hevalen dineve qowîşekedene.
Ji cara peşîn mayî geleken nas hene. Hinek jî hatine berdane. Evv herdu dizen cara dine tunebûn niha. Evv xorte tendûrekî, ku be hemdîxwe
xeberdida bcbar kiribûn. Gişta jî derseka mezin je girtibû. Qet yek ji vvan, niha virde vvede xeber nade.
Heftekede hemû cî bûbûn. Qet kemasiyen vvan tunebûn. Du kesan bi dor xwarin çedikir. Ji gund feraq û tişten din anîbûn. Paşe dibûne du çîka. Li cem hev, ser nivîna rûdiniştin, xwarina xwe dbcvvarin. Birî nen vvan pak bûbûn, le hela he peçiya Soro dieşiya, jan dida.
Li vvan qowîşen piçûk, çend kese ku Soro ji cara peşîn nas dikir, he bûn. Hatibûne cem Soro û sencvveşî dabûne wî û hevalen vvî. Soro ge lekî kebcvveş bû ku Bekir dîsa dît. Cara dine hevaltîke pir delal kiribûn bi hevre. Devva wî xilas bûbû. Zede ceza nedabûne. Ale dine pir çûbûne ser, wî jîxwe parastibû digot hakim di qerare xwede. Panzde ro ja bere, bi ser xwastina vvî, ji girtîgeha vvîlayete hatibû vir.
Biraye Soro, seroke mehkeme pir baş bû. yekî vvekî bave meri ya. Yekî civvan bû le ji bave meriya zedetir bû. Ji hale kesan fem dikir. Feqîranre bavti dikir. Min jere got, wî jî bi sebr guhdarî kir. Guhdarî kir. Beje küre min got. Bavver kir ku ez derevvan nakim. Yen hatine sere me gişt rastin, em be sûcin. Şahid jî nîn bûn. Çend kes bûn. Yen dîtî tunebûn. Çi bejin ji tere? Gunehe vvîbi hale me hat. Nizanim, tiştne

direj got. Xwe parastin, kişînî kirin... Poşman bûyî got. Davviyede se sal ceza da min. Ez bereve bi se salan razîbûm. Hatime girtîgehe. Hineken kevn hebûn li vvir... Ji abûqatan betir zanibûn. Min pirsî. Dev je berde. Bavtîke mezin ji tere kiriye, 'temyiz' neke, gotin. Min jî vvisa kir. Ya kutasî, tiştekî wisa direj nemaye. Xweha min niha bi kurape minre zevviciye. Tu hundirdayî, em davvete nakin, gotin. Min got, lavvo tu semeyî an be aqüî? Tu nabînî ku sere me ji belan xüas nabe. He la he derdekî nû nehatiye ser vve, herin bizevvicin. Wan jî di nav çend

244

malande dîlan û davvet kirin. Niha gelekî dibcvveşin. Qedre hev zanin. Zû, zû serî didine min. Li min dipirsin. Hemû kemasiyen min tinine cî.

Niha ji bere betir bedeng bû. Bere baştir însan nas dikir. Li baxçe bi Sorore digeriya. Bi lez lez diçûn, kurt dibiriyan gera xwe. Li girtîgehan vvüo digerîn girtî. Jere, 'volta' dibejin. Qala girtîgeha vvîlayete, girtiyan û mehkeme dikir. Zûtire destura vvan diqediya, diketin hun dir. Bekir hedî hedî bû hevale hemû tendurekiyan.

Hefta peşîn, gundiyan li girtîgehe xerîbî dikişandin. Nikaribûn re het herine baxçe û avdese. Eman, eman di nav xelqe xerîbde tiştne şaş, şermoke nekin digotin ji hevre. Loma ditirsiyan. Xerîbiya vvan ji her aliyen vvan dihate ferq kirine û xwendine. Dema ku girtiyen derkevin li baxçe, ye kevn rind zanibûn ye çi bikin. Bi tivdarek bûn. Bi derketineve, di alîkî baxçe lez bi lez diçûn, dihatin. Volte davetin. Tendûrekiya tiştek nizanibûn. Vî yalî, wî yalî li dora xwe diniherî û digeriyan.

Paşe şerm dikirin, diçûne quncikekî baxçe, di nav xwede xeber didan. Qala ciye xwenî nû dikirin.

Soro û Bekir, qaîden girtîgehe, gerandine bi vvan jî dane hînkirine. Bi vî tehrî waxt betir derbas dibû û he rehet digeriyan.

Yen ku cezayen vvan zedene û yen kevn, girtîgehede bi qedir û qîmetin. Ji vvanre hürmet te kirine, tendurekiyan jî ev ferq kirin. Simelen vvane badayî, desten vvan li ser qûne, di destande tizbiyen mezin hebûn. Gişta jî evv nas dikirin. Di gerede re didane vvan, deste xwe dibirine
ser singe xwe û silav didane.
Sergardiyan hale vvan dipirsiya. Nedbcvvast ku ber xwe bikevin. Li bajer, derheqe vvande, çi dihate gotine, car caran di peyiven xwede ji vvanre digot.
Di davviya heftede, rojeke, abûqate vvan û Xale Mihe hatine girtî gehe. Li oda nivîsdarde, Soro û çend kes çûne cem. Xale Mihe pir dil xemgîn bû. Ji bo cîranen xwe nedisitirî. Cîran li gund kom bûne, Mi he şandine ba abûqat. Hinek pere vvan, ji cara peşîn, pare mabû. Gun diyen vvan hundirde û evv di malen xwede, qet xwede qebûl dike? Çûbûn bi abûqatre xeber dabûn. Du hezar paqnot dabûne. Di piştî berdana vvan, vve du hezare din jî bidane. Abûqat hela he wext nebuhurî, vve îro li hemberî girtina vvan bisekiniya, îstida binivîsiya. Abûqat Fi hat beg li avdcstxane bû. Xale Mihe, di nav çend deqîqande evana ji Soro vvanre got. Fihat beg hat, bi sereser li ruye vvan niherî. Bi ecele: Bereve vvekeleta vve li cem min hebû. Eze îro, ji bo berdana vve îstîdaye bidim. Texmîn dikim ku vve be qebûlkirine. Hûne bene ber-
245
dane. Cane vve saxbe. We giştan gotiye ku me tevayî kir. Tiştekî rinde. Le bi alîkîde jî tede qebûlkirin heye, ev ne rinde. Levvra, dibe ku hi nekî bi zehmetbe. Hela ka, bi destura xwede, eze vve bidime berdane. Ku ji derî derketin, Xale Mihe zûtire xatire xwe ji gundiyen xwe xwast û li pey abûqat ket.
Soro, Mîro û Bekir vve evare li ser ciye Seît rûniştibûn, dipeyivîn.

Lo lo hevalno. Ya rastî Xale Mihe merîkî başe. Le bele hinekî semeye. Çend paqnot peren gundiya hebûn. Gişt, zeren sere jin, bûk û keçan bûn. Hemû bir kire gevvriya vî abûqatî benamûs. Cara peşîn em birin li vvîvvalandin. Penc hezare me daye. Qet ji mere nebû tişte kîjî. Xera wî negihişte me. Nihajîye mayî, bir çû daye. Abûqat ter nebûye. Eve jî badilhevva here. Paşe gundiyen herin pesîra Xale Mihe bigrin. Lo kale xurifî. Were ji me jî bipirse. Paşe here cem abûqate ne bimbarek. Jijinen xwere kiras, derpiya nestînin, peran bibin bbdne be rîka Fihat bege. Bekir jî sere xwe pere bakir.

Ez li vvîlayete, di girtîgehede bûm. Fihat bege devven gelek girtiyan diniherî. Digotin ku pera pir distîne. Hinekan pesne wî didan.

Le bele hinekan jî de û jina vvîre didane xebera. Hemû karen vvan li ser nezaniya meye. Eme hinekan bikujin. Em hevdu dixwin û qira hev tînin. Evv jî tere nake. Deste mede, berîka mede çi heye, eme bibin bi dine kesen vveha.

Mîro he betir diqehiriya:

Te cima ji minre negot? Me berî herduyan jî bida. Li pist xwe neniherî, bira biçûna. Derd û kulen me ne besî mene? Serde jî Fihat beg bû bare hustiye me. Lo Miheyî qûn bi gû. Em ji birçîna dimirin, tu du hezara didî Fihate segbav. Xwede ji herduyanre jî nehele, seybisanno.

Di hişe xwede hejmartin, dikire çil û penc zeren Reşad. Tu tiştek jî ji desten vvan nedihat. Ji girtîgehe denge vvan nediçû gund. Soro diqehirî, bîhna wî teng dibû. ,

Çend kes ji vvan, çend li ser îstîda abûqat hevîdar bûn. îro anjî sibe vve bihatana berdane edî. Xwejî nizanibû çimaye, le Soro, di dile xwede qet tîrjeka heviye nedidît. Ve dîtina xwe ji Mîro û Bekir tenere got.Li ser îstida abûqat, çend roj derbas bûn. Rojeke hine kaxiz anîn,

ji vvanre xwendin. Xwastina abûqat nedihate qebûlkirine. Ev deriya jî hate girtine. Çend kes ji vvan, ber xwe ketin, reşe reş dibenijiyan. So ro ku ev ferq dikir, diçû cem vvan. Dipeyiviyan. Evv didane bavverkirine ku gelekî di hundirde namînin. We derkevin. Ve diltengiye jî zede nekişand. Hate ji bîrkirine. Girtîgeh dîsa bû vvekî mala vvan. Kesî edî
246
qala berdane nedikir. Niha panzde roj bû ku Tendûrekiya girtibûn. Di nava çar dîvvarande bûn. Wekî xelqe maleke tev dbcvvin û vedbcvvin. Hela serde jî tev difikirîn.
-XXXVRojen
dîtina girtiyan dûşem û pencşem bûn. Le bele rojen dine jî
qet kes vala nedizivirî. Giştan meriven xwe didîtin. Ji berede vveha bû, niha jî wisa diçû. Derîkî mezin, hesinen qalind hebûn nava girtiye hun dir û dîtiyen vvande. Girtî û yen ku hatine dîtina vvan, nezî derî û he sinen qalind dibin û xeber didin. Heke ku vve roje gelek kes hatibin ji bo dîtine, deng tevî hev dibin. Gotinen kesî nedihate femkirine. Levv ra, her zede diqîriyan. Ye nezî vvî, bo ku denge wî here dîtiye vvî, ve çare her betir diqîriya. Dest û milen xwe dihejand.
Gundî caran bi hesp û keranve dihatin. Jin, mer, zar, ji her salan meriv hebûn di navde. Di deste vvande satilen mast, heqîwen pişta vvande nan, pener, nîsk, bubcur hebûn. Fekî, heşinavîjî dihanîn bi xwere. Jin û zar bi stuxarî li ye hundur meze dikirin. Perîşaniya vvan ji kin cen ser û ser piyen vvan dihate xuyane. Ji sibe zû, hela ro der neketî dihatin, li ber dere girtîgehe li benda seheta dîtine diman.
îro roja dîtineye. Dîsa qelebalbc heye. Ji Tendureke jî pir kes hati ne dîtina girtiyen xwe. Xwarin bi xwere anîne. Gören hirî perene. Ji hundir yek dudu nezî derî û hesina dibe, çend pirsa dike û hela goti nen wî neqedyayî yen dine dihatin. Ye hatî, silaven gundiyen xwe di

gotin. Malen vvan bi rehet re diçûn. Her tişt vvekî bere. Çilo hiştine dî sa vvisa. Küre axe, hela he ji nexweşxane derneketiye. Li pey bave vvî, diya wî jî hatiye gund. Niha jina Maruf li cem vviye. Yen ku evv dîtine, dibejin ku zimane wî her diçe giran dibe. Alîkî deve vvî, piçekî xwar bûye. Doxtiran gotiye ku vve pak bibe, le bele her diçe bi zehmet dipeyive.

Zevî, çayîr û kare gund bi re diçû. Xale Mihe pir dil xemgîne ku evv nehatine berdane. Gelekî poşmane ku peren mayî jî daye abûqat. Gundiyan jere pirsen giran gotine, him jî li rûye vvî. Dema ku Fate bi hîst, vvekî dîna, aqü ji serî çû.

Çavva dibe, gotin û gura evî xurifî dikin? Cima li gund, qet yekî aqil li serî nemaye? Piştî awqas ceribandine, dîsa jî li pey wî herin. Ax, ax bira ez li gund buma. Mine, evv du muyen ruye vviyî köse jî birûçi-

247

kandina. Bira roja xwe bidîta. Xwarziye Soro jî hatibû. Küre Fate bir çû cem diya vvî. Paşe zivirî ba xale xwe.

Caran, gardiyanan ku dil bikiran, zaren piçûk hildidane hundir.

Çend zar hebûn ve gave li girtîgehe. Girtiyan şekir, pere û tişt didine vvana û hez dikin.

Bekir demeke gazî Soro kir:

- Were, Hela vvere birange Soro.

Pismame wî hatibû dîtine. Dûrve hevdu dane naskirine. Kef, xweşî dane hevdu. Li ale meran dîtin bi vî tehrî, bi perîşanî dibû. Li ale jinan, Fate herdu küren xwe yek li ser çöken xwe, ye din li cem xwe da bû rûniştandine. Evv maç dikir, hez dikir. Küre vveyî piçûk bi dil, şehye xwe da biraye xwenî mezin. Evvî jî pore xwe şü û şeh dikir. Le pore vvî vvekî kulavan bûbû bi neşûştine. Levvra şeh le nedbcevvitî. Küre vve bi kef bû. Li dervayî telen dora girtîgehe, bi tirs, nezîk nebû, bere. Ji

dûrve li diya xwe niherî. Paşe eşkere nobedar evv hilda hundir. Reviya, diya xwe hemez kir. Sere xwe kire paşila vve. Herdu jî bi bîstekî kurt giriyan û paşe çûne hundir. Bi xaltiya Zelexave dima. Kare male û gund, bi vvekî hişe xwe ji diya xwere qal kir. Bi Elîre hatibû, Eliye paşe be û wî ji vir hilde.

Diya wî zûtire av germ kir û küre xwe şûşt. Navroj tev xwarin. Diya Esmere tirî û to hanîbû ji bo qîza xwe. Dane wî jî. Diya vve ya feqîr, ji keça xwe betir heliyabû. Tu nemabû. Kafire ape vve, hela dîsa dida xeberan

û diqîriya. Jinapa vve jere dizîka pere, leçek û destmal şandibû.

Jinmama vve li ser diya vvede çend cara giriyabû:

Ez zanim, tu guneh û sûce Esmere tüne. Rastî vvehaye, le bele ke ev mere minî anut dikare serwaxt bike.

Gundiyen vvan vve zû vegeriyan, levvra diya Esmere seheteke tene ma. Nikaribû j i diya xwe biqete. Gelekî dibcvveş bû ku jinmama vve, vve ha difikirî û dilşevvitiye. Jinapa vve hate bîre. Evv rojen bere. Evve jî, ji napa xwe hez dikir. Ji ale jina, kesek nehatibû dîtina Gulîzere. Du, se deqîqa careke derdikeve ber derî, li dûr dinihere. Bi dil şikestî, kelo girî, çaven vve hema usa di rede bûn. Paşe heviya xwe birrî, bi zaren Fatere dest bi hinekan kir.

Bi evaren rojen dîtine û rojen pey, vvan qowîşen mezinde qumar dileystin girtiyan di nav xwede. Ne qumaren giran bûn awqas. Le vvan qowîşen piçûkde qumaren mezin dihate danîne. Zar davetin. Ve eva re Bekir, Soro, Mîro bi çend hevalanve, dîsa li ser ciya rûniştibûn, xeber didan. Li ale dine dame düeystin. Rezen dame li ser qartonekî qalind çekiribûn. Bi keviren reş û spî düeystin. Oedereke şûnve ji wî alî:

248

Kevire te nediçû vvir. Te cbdzî kir.

Bave te cbdzî dike lavvo. Eze yeke li deve texim ha.
Bere ji hevre be töre xeberdan, paşe de û bave hevre dane xebera û çera. Çend kes ji ser nivînan banzdane jere. Ketine nava vvan. Du zilam, ji gundekî bûn, Yekî dine qusandibûn di quncikekîde. Ji xwede, ji der doran gihîştine, nehiştin şer zede bibe.
Ji qelebalixa hundirre:
Çiye, çi dibe li vvir? Dîsa ke dikire mirte mirt? digot evv gardiya na terikiyî beteşe.
Te digot ku qet tiştek nebûye. Hemûyan denge xwe birrî. Zanibûn ku ev gardiyana be merhemete. Dibir û dikuta, gardiyan. Deste wî jî vvisa giran bû. Bi du kulman de, sîllande meriv vveldigeriya. Ke şer bi kira davviyede poşman dibû. Heke ku wisa nekira, girtîgeh re nedibir. Gura kesî nedikirin paşe.
Tiştek tüne, bege min. Heval henekan dikin.
Bira heneken keran nînbin. Çi zanim.
Piştî çûyina gardiyan, te digot ku vvan şer nekiriye, dîsa rûniştin, ji bo lîstine. Yen dore, bedeng li vvan meze dikirin. Dizanibûn ku ji sebebeke pir piçûk, sere vvan vve dîsa dest pe bikira.
Li aliye Soro vvan, peyivandin, sohbeteke serîn hebû. Xortekî di ha le xwede, kîbar, Xalis nezî vvan bû. Bere, li çiyan, demeke geriyabû, paşe xwe bi xwe dabû dest. Xalis kem xeber dida. Zede guhdarî dikir. Hemûyan zanibû ev edeten vvî. Cara, kesî qet evv ferq nedikir. Bi vî halî, evvî hemû kesan guhdarî dikir. Evv nas dikirin. Çaven xwe ji ten durekiyan neqetandibû. Ferq kir ku hemû jî meriven başin. Bi hevre rind re diçin. Soro û Mîrore hürmet dikin. Bereve baş hîn bûbû ku me riv gerek bi tivdarekbe, pir xeber nede û zûtire bi kesîre nebe dost. Xalis ji van gotinan her tim xer dîtibû. Levvra bi tendûrekiyanre zûti re hevaltî daneynî. Piştî demeke, evv baş nas kiribûn edî. Cezaye vvî

kem bû. Dijminan dest je vekişandine û levvra hesa xelas bûbû, digot girtiyen dine, ji bo vvî.
Çay vedbcvvarin, qala gund dikirin. Paşe Xalis qala îbo kir. Gişt şaş û metel man. Virde, vvede pir tişt bihîstibûn derheqe vvîde. Soro û Mî ro li ruye hev niherîn, dema ku nave îbo derbas bû. Çavva hatibûne cem hev, hevdu dîtibûn... Rojen vvane tengasî, giran û birçî, li sere çi yan. Cendirman çilo dora vvan girtibûn. Vana hemûyan, vvekî bûyeren her rojî qal dikir Xalis. Oerardayina davviyede... Li Tendureke, vve çi lo Ûsiv axa bikuştana? Çi tehrî ji hevalen xwe qetyabû. Qala ape Sîno, îbo kir. Çavva, vvekî biran evv dabûne re. Pere dabûne. Nû, ji serîde di-
249
jiya evv demana. Çaven wî li dûr diniherîn. Paşe bihîstibû ku evv berve rojhilat, evv çiyayen re nedayî çûne. Li vvan dera û baş bûne.
Dema ku evv guhdarî kirin, evv Oeyseriye xwaye traktöre, mirina vvî, peçiyen Ûsiv axaye birîndar û rojen bi zehmet hatine bîra vvan. Çi teh rî miriye Oeyserî ji göre derxistibûn û biribûn?
Xalis bi dil û dost bû hevale vvan. Ji vve şeve şûnve, mîna Bekir, evv jî hevale Soro vvan bû. Him jî gelek nezî vvan.
Li girtîgeha meriv hertim dikare ji bo xeberdane gelek tiştan bibî ne. Hinek ji neçîrvanî û mala xwe, hinek ji meneasî û çilo tele haniye sere dijmine xwe dipeyiviya. Ji cin û periyan. Ji vve dine. Hinek tişten ku qet nayen bîr û aqile kesî. Ji zorbetiya axan, dikarin bi rojan qal bi kin. Di alîkî dinde, methen axan bikin, vvan hildine ser sere xwe.
Li pey hatina tendurekiyan, li girtîgehe, her betir qala axan dihate kirine. Gelek gundiyen ku ji axan kişandine, tevî xeberdanan dibûn. Li ku yekî tendûrekî rûniştibû, pirs diçû û diziviriya, dihate ser kiri nen axan û began. Zorbetiya vvan ya îro.
Hûn îbrahîm axaye Millî, evve bi nav û deng, zanin. îbrahîm paşa

ya Millî. Zilm û teda wî gihîştibû erd û ezmanan. Zuma Siltan Evdilhemîd li cem ya wî ne tu tişte. Evv ciyen ku evvî talan dikirin, ji çîvikanre jî tiştek nedihîşt. Kînge bbcvvasta, ne tene merîk, gundek bi tevayî ji rûye dine radikir. Kînge dil bikira, günden hinekan ji desten vvan di girt û dida kesen dine. Osmaniya jî pere serederî nedikirin. Zilm û zilm... Le xvvede ji vvîre jî nehişt.

Kalkiye min qal dikir. Digot ku ji günde me vve de, axayek hebûye. Rojeke, bûkeke bedevv diçe ave. Dbcvvaze ku dest baveje feqîre. Ji merive ku li cem dbcebitere dibeje û gazî büke dike. Belengaze merik dizivire û çi dibîne? Bûk, bûka wî bi xwe ye. «Eman axa, ez teme lin gen te. Eva bûka mine...» gotiye, le dîsa jî axe qerare xwe neguhartiye. Çûye ba bûka xulame xwe. Dîn û îman bi van kafýranre tüne. Wexteke bere, le nizanim kînge, axayek, hersa wî te, diqehire.

Sere gundîkî bi saxî, darekîve dide mbc kirine. Careke jî yekî rût tezî û paşe dimis bi serde dike û bi darekeve gire dide. Germa havîne ya ku diqijirîne. Merik dü rojade dimire.

Ev çîrok hertim dihatine gotine. Tişten vvüo ku hinekan heta niha qet nebihîstibûn. Zorbetî û van gotinan gundî nezî hev dikirin. Xeberdane niha j i yen bere zedetir bi qîmet bûn.

Soro, piştî nîvro, li qowîşa dine, li cem hevale xwe bû. Pirs zivirî û hate ser kirinen vvan yen gund. Seîd dîtinen xwe vvüo digot:

250

Bere, li gund, bi tevayî karek kirin zehmet bû. Ya rastî kesîjî he vî nedikir. Levvra nîve gund, qetyan û çûn. Te digot ku ji yekbûne di tirsiyan. Bavveriya vvanxwe bixwe tunebû. Qet nebihîstibûn kubi axanre serederî te kirine. Yen mayî, hineken vvan gelekî diqehiriyan ji axa. Çend malji bo xatire cîrantiye, anjî tiştekî dine ku bikin tunebûn, levv ra li gund man û bi tevayî li hember axe sekinin. Le bele niha hemû

fem dikin ku yekbûn, bi tevayî re çûyin sere her tiştiye. Wüo nebe, bi axanre serederî nabe. Tendurekiyan jî wisa kiribûn. Çilo bi tevayî ri kefî Maruf kiribûn? Tu tiştekî nikaribû vvan bide sekinandine. Niha, ji bere betir, bi xwe bavver dikirin. Axa bi vvan nikaribû edî. Paşe, he mûyan gotinen xwe kiribûne yek. Li qereqole, li ba savvcî gişta mîna nî hev xeber dabûn. Ev tiştekî pir giranbihabû.
Cbcaren xwe nû dikirin. Giştan gotinen Seîd di cîde didîtin. Diranen Tahir şikestibûn û bi alîkî diranan xwarin dbcvvar. Wî: Heke ku yekî em hîn bikira, tu ev dihatine sere me. Peşiyen me jî vvisa. Em ji nezaniya xwe dikşînin, got.
Soro dît ku Tahir pirsa xwe birrî:
Raste. Ji nezaniya me. Le bele tiştekî din jî heye. Heke ku ev traktör û hesin nehatana, hela he evxewa me vve gelekî bikişanda. Van hesinan gund tevîhev kirine. Van hesinan em li hemberî axe dendstine. Evv ku derketin, axa edî ne hevvcî me bû. Axe ku re da me, em bi tevayî li hember derketin. Li hemû deran jî vvüo ye. Hinek mîna me li peş, şer dikin. Li hinek ciyan gundî, gundan vala dikin û diçin. Ya kin û kuta, li her deran tiştin dibin niha. Le ye herî giranbiha, yekbûn û bi tevayî li peş sekinandina meye. Eva ne tiştekî vvüo hesaye. Ye herî zeh met eve, got.
Yekîje pirsî:
Ana, vir ha vve çilo bibe?
Soro hedî hedî û yek, yek bersiva wî daye.
Qet. Çiye bibe? Ûsiv axa nikare niha gundiyen mayîbaveje der. Serde jî küre wî birîndare. Hela he li nexweşxanedeye. Derde wî ji ye me ne kemtire. Niha xetereke mezin tüne. Savvcî vve vî yalî û wî yalî binhere. Nikare kesî teke gunehkare vî karî. Eme demeke li ve dere bimînin. Eve hemû tişt.

Cîrane wî ye dine:
Tu ji ha'e Mihere çi dibejî? Awqas pere bi gevvriya abûqatde da daqultandine. Qet kerî karekî jî nehat abûqat. Ve birçîbûn û belengaziya mede, em peren xwe didine yen vveha, got û xwast ku he jî beje.
Le Soro kete nava pirsen vvî.
251
Eme veya paşe bifikirin. Hela bisekine. Hela ka cîranen me yen li gund çi dibejin? Em ve paşe xeber bidin. Eme bipirsin, cima û çilo bû? Gerek em wisa be davvî nehelin.
Paşe keniya:
Küre Fate got. Diya wî gotiye ku yen evvî devgenî û köse bavver dikin, gelo qet piçikek aqü pere heye. Gundek bi tevayî qir bû, her tişt di deste vvîde ma? Heke ku ez li gund buma, mine evv rûye wî ye köse biçirikanda. Hela bira ve hcftc bene, ka çi xeberan tînin.
Tendûrekiya, Bekir, Xalis bi gundiyanre car caran ev karan dipeyivîn. Hildidan û dadanýn le reyeke bi aqü nikaribûn bidîtina. Ji serî de difikiriyan. Hineken ku salen vvan ji tendurekiyan zedetir, car ca ran evv şîret dikirin. Qala bere dikirin. Çilo bi axanre gundiyan şer û gilî kirine.
Herşev an dama an jîgustîl veşartin düeystin girtiyan. Leystiken be re û hesan bûn. Heke ku leystike vvan li ser peraba, zede kes komî do ra vvan dibûn. Hinek caran yen ku dengen vvan xweşin, kilam digotin. Şevan gerek sehet nehande elektrik bihatana damirandine û girtî razana, le bele vvüo nedibû. Direj dibû, diçû heta sehet yanzda. Hinek li ser ciyen xwe direj dibûn. Li jore diniherîn. Hinek kom dibûn, dengbej guhdarî dikirin. Mihemed bi sûce rebirrîne, şelandine ketibû gir tîgehe. Denge wî mînanî zengilan bû. Dile meriyan diheland. Caran bo guhdarî kirina vvî, girtiyen qowîşen dine, gardiyan û eşkere nobe

dar jî dihatin. Dema ku gardiyan dihat, hemû radibûne pe. Dbcvvastin ku be li ser ciye vvan rûne. Gardiyan ku bi yekîre xeber bida, anjî bi çûya li ser ciye wî rûnişta, eva tiştekî pir mezin bû ji bo wî girtî. Le be le, gardiyan jî her tim diçûne ba yen ku bi îtbar û bi qîmetin. Cbcaren baş, çay û caran şerinayî jere dianîn.
Mihemed îşev dest bi kilama 'Saliho û Nûre' kir. Geleken guhdaran dibcemgîn dibûn. Di nav küamede ku qala jiyana girtîgehe, jina vvî, derd û kule vvan dibû, geleken girtiyan jiyan û mala xwe dianîne bîra xwe. Salih û Nûre, pismam û dotmamin. Bi dibevvestî bi hevre dizevvicin. Jiyana vvan xweşe û bi dile vvane. Li vvan deran, bedevvbûne, li ser Nûrere kes tüne. Salih xortekî mencase. Rojeke ji rojan Salih ledbce dijmine xwe dikuje. Wî digirin, davejin girtîgeha, kela Diyarbekire. Cezakî giran didine. Di jiyana emre xwe vve girtîbe. Le Nûre, xwe daveje her dere. Rojeke sibe zû te ber dere girtîgehe, ji bo dîtina mere xwe. Salih gelekî dilteng dibe, ditirse. Ji tirsa diricife, dilerize. Yen ku bi jiyana emre xwe cezye girtibûne distînin, gelek caran jinen vvan ten û dbcvvazin ku mere vvan, vvan berde. Nikaha vvan be hildane. Saliho
252
ev bihîstibû, zanibû. Heviya derketine ku tunebe, hinek jin taqet na kin edî behevî, li male rûnin. Jiyan jî zehmete, levvra ve re diceribînin. Salih hevv zanibû ku Nûre jîbi ve xwastine hatiye. Nûreji Saliho dipirse, cima vvüo bereng û spîçilokiye? Nexweşbûn û nebûna wî dipirse.
Salih sebebe tirsa xwe jere dibeje: «Dile mere te, vvekî gola Waneye. Dilekî fýrehe. Tede tirs tüne. Le ez ditirsiyam ku tu hatî, ji bo devva jinberdane.» Li ser ve Nûre bersiva wî dide. Mirin tene dikare vve ji Saliho biqetîne. Ji bo xilasbûna wî vve here merkeza cumhuriyete, Enqere.
We lava bike û wî bide xüaskirine... Di kilamede vvüo te nîşandane

ku diçe xwe daveje ber bexte seroke mehkema giran û herî me
zin, li Enqere. Mere xwe ji girtîgeh û kela Diyarbekire dide berdane.
Li der doran pirs bela dibin. Nûre bi seroke mehkema giran û ya Enqereve
tişten nece, nepak kirine û ev kare pir giran hatiye cî, Saliho
xüas bûye. Jin û mer, kevir û kuçik, li her dere wisa te gotine. Salih dilxemgîn,
dübirîndar dibe. Li ser van gotinan, Nura feqîr dide ber ke
ran, qul qulî, pirtî pirtî dike, dikuje. Ve çare Saliho te darde kirine.
Kilam ku xüas bû, kesî nizanibû ku guhdar çi difikiriyan. Nûre yen,
hemûyan dihatine peş çaven vvan. Paşe Mihemed çend kilamen dine,
ji hevdu xweştir got. Hinek li ser zordestiya axakî, hinek mencasî û dest
vekirîbûna axakî bûn. Kîjan rast bû, nedihate zanîne. Kilamen vveha
gelek gelek bûn.
Dengbejen axan hebûne bere. Evvana, kilaman davejine ser axayen
xwe. Pesnan didine û vvan derdbdne ezmanan. Ev kilaman hetanî ni
ha jî tene gotine. Hine kilam jî li ser bûyînen mezinin. Meriv di vvan
kilamande, vvan kesen vve çaxe baş nas dike. Çi kes bûne, çi tehrî fikirîne,
çilo mer bûne? Wisa dihate xuyane ku li van deran, gelek tişt nehatine
nivisandine û levvra ketine nav kilamen xelqe. Li girtîgehede
heke ku kilam nebin, tu cara wext û roj derbas nabin. Le ye ku dibe
je, gerek baş bizanibe û hale meriyan fem bike. Gerek tişten reş, tarî
û dibcemgîn nebeje. Kilamen bîhna meriyan vekin, hevîbûne bidine
meriyan, beje. We çaxe tu bibîne girtî çilo kefxweş û bi bîr û bavverin.
Çavva dest bi hezkirina jiyane dikin. Berdane tînine bîra xwe, qala bibaxişandine
û bîra rojen derve dikin. Zû bi zû seven wisa dibin di qovvîşande.
Li qowîşa sisya. mezinde du girtî hene. Ji günden destene. Yek ji
vvan, kine û rûye wî vvekî kartolaye. Rû û hustiye wî ji pirce naye dîti

ne. Rûye wî mînanî geliyane. Çaven wî tene tene xuyane. Wekî tejiken hirçan. Poze wî mezin mînanî şûrekî, dijorde daliqandiye. Xwe jîqelevve. Dema ku qisc dike, tu dibejî zimane wî li ciyekî ase dibe. Heva-
253
le wî piçekî zerînî, direj û zirave. Ji niherandina vvî, meriv fem dike ku ji evvî qelew şeytantire. Gelek rûvî di hişe vvîde radizen. Le bele, kem xeber dide. Loma meriv te dernaxe. Li gund yekî devvlemend bi pe ran, evvana kişkişî yekî dine kiribû. Devveka vvan li ser erd, zevî û mergan hebûye. Herduka merik dabûne nava xwe. wisa te xuyane ku heft ruhe wî hebûne. Bi keran nehatiye kuştine. Car caran bi hevdure şer dikin. «Sûce te bû. Na, tu nebûya min xwe bi vî karî nedivvaland.» Le piştî nîv sehetekî tiştekî vvan nedima.
Li baxçe, roj dibiriqî. Hevva xweş bû. Li ber dîvvaran hinekan cbcaren xwe dipeçandin û dipeyiviyan. Hinek diçûn û dihatin. Pegermok dikirin. Soro, Bekir, û hevalen vvanî nû Xalis, bi hevre bûn. Xalis qala rojen vvane li çiyan dikir. Ji ape Sîno, îbo xeber dida. Mîro, Seîd û Tahire ku diranen wî ji kulmen qumandar hatibûn şikestine, di alîkî dinede dimeşiyan. Tahir kete nav pirsen derheqe axa û gundiyan.
Yen ku alî axan dikin, hemû be dîn û be îmanin. Gelo tu şeref û namus bi vvanre heye? Çend kesen be şîr ji me jî derketin. Xirabî û be şerefiya vvan, ji vvanre ma.
Evv gundiye mînanî hirçan û hevale wî ji cem vvanre derbas dibûn. Guh dane van gotinan. Her dizanibûn ku van pirsan ji bo vvan dibejin. Herdu heval dimeşiyan û di vegerandine, hela he yen dine qise diki rin.
Mîro:
Hertim, yen ku ji axanre kûçiktiye bikin hene. Ji sedan yekbe jî, dîsa te dîtine.

Evve rû bi pirç tamîş nebû.
Lavvo, kûçike küre kûçika. Tu, van ji kere dibejî? Tu ji kere di bejî kûçik? Ere?
Qet haya Mîro ji vvan tunebû. Nişkeve li cem vvan, li ser piyan bûn. Mîro wisa bi dil qise dikir ku qet evv ferq nedikir.
Nede xeberan. Be terbiya. Çi dayin û sitandina min bi tere he ye? Kî bi tere qise dike?
Ye dine hela he dikire mirte mirt. Dbcvvast ku rikefî Mîro bike. He vale vviyî zirav û direj, 'gelo bere li kîjanî xim' difýkiriya, di dile xwede. Soro gihîşte vvir. Tendûrekiyen dine jî li pey hev hatin. Li ser ve, herd gundiyan xwe nizm kirin, xwe dakişandin. Soro bi zimanekî nerm evv dûndstin.
Hetanî evare bi vvan herdu gundiyanre ma Soro. Zordestî û zuma axan, çi hanîbûn sere Tendurekiyan, qal kir. Qisa Mîro li ser vvan axan bû. Tu kare Mîro, bi van herdu gundiyanre nîn bû.
254
Biniherin, hûn jî xapandin. Qet tu xirabiya wî merikî bi vvere tu nebû. We çû, peşiya wî girt. Da ber keran. We le bû ku merik bikujin. Paşe çi bû? Axa dîsa li dervaye. Bi kefa xwedeye. Hûn jî di hundirde, ji ber axe radizen. Tene rizandine. Qet hat û hûn pirsîn? Kare vve he tanî vir bû. Evv, ser di berde, bedeng û kerr bûn.
Le birano. Gerek meriv bi vvan bavveriye neke. Her car ye mîna nî te, ye mînanî min zirare dibinin.
Evv bi çend gotinen kurt tevî xeberdane dibûn. Pirî kerr bûn. Wexta vvan hat, çûne hundir. Li vve dere jî çendekî xeberdan.
Soro paşe van peyiven xwe ji Bekir û Xalisre got. Herduyan jî heq dane vvî. Serde Bekir wisa qal kir:
Li ale me, li günde me, yen vveha gelekin. Xulamtî, bendetî di

hestiyen vvandeye. Ji merivtiye derketine. Wekî kûçikanin. Tu çiqasî lexî, zilme pe bikî, qasekî şûnde dîsa te û poçika xwe li dora te dihejîne. Meriv nikare vvan bîne re.
Xalis qal kir ku yen vveha li her dere hene. Dema ku li çiye bûn, direviyan, çend kes bi çaven xwe dîtibûn. Ji axan ditirsiyan ûji vvanre koletî dikirin.
Soro heta davviye guhdarî kir.
Le çi dibe bira bibe. Bi yen vvehare xeberdan ne be feydeye. Ji sedan yek jî fem bike û be guhartine, evv jî kare. Levvra, yen avvha bîze meriyan tînin, le dîsa jî gere meriv nepakiya vvan bîne bîra vvan.
Wan rojen dine jî, Soro bi van herdûyanre mijûl bû. Ve çare edîxeber didan. Wekî bere kerr, bedeng neradivvestiyan.
Wisa bûye. Xvvede avvha çekiriye. Meriv be axa nabin. Qet gün de be axa dibin? digotin.
Caran heq didane qisen Soro, le dîsa jî li hember bûn.
Gotinen te hemû rastin. Yen kû zordestiye, zilme dikin hene. Le bele ne hemû. Wexta ku vvisaye, axa nebe, kiye gundiyan bipareze? Ki ye evv memur û evv cendirmen tene gund, teke mevan? Tazî û birçiyen mîna me? Paşe tu nizanî cima, çi te sere keriyen be şivan? Xwede ku pez da, şivan jî pere da, ne vvisane? Kî dikare bi axanre serederiye bi ke?
Evve vvekî hirçan, bi pirç her betir tişten be aqü digotin. Axe me xirawbc jî, axe meye. Bira ne başbe. Xvvede bira vviya ji sere me kem neke.
Paşe Soro dîsa bi vvanre hevaltî kir. Te gîhîşt ku xulam û bende axe zû bi zû nayen guhartine. Her tim kem û zede vve wisa hene. Di wexteke direjde, dibe ku hinek pak bibin. Le geleken vvan ji ve hezeka zir-
255

mbce xüas nabin. Careke jiyana bi namus, serbilindî vvinda kirine. Ji nüve le xweyîbûn, ne hesaye. Li vî alîde pir zehmete. Çend rojen So ro, bi vvanre vvüo çûn.
Yen ku mehkemen vvan nezîk dibûn, dest pe dikirin dua dbcvvendin. Caran bereve qerar didan ku vve çend dua bbcvvînin. Bavver diki rin ku vve bene berdane, ji bo xatire van duan. Levvra dema ku digeri yan, rûdiniştin, li baxçe û hundirde hertim di nav leven xwede dbcvvendin.
Bo ku hejmaran bîr nekin, an keviren piçûk dbdstine berîka xwe an jî, li dîvvaran çbdz dikirin. Ayeten ceribandî dizanibûn. Wüo bavver dikirin ku li ser van ayetan, hakim û savvcî vve alî vvan bikin. Deve vvan dihate girtine. Li girtîgehen dinede, nivişten wisa hebûne ku, girtî vve dike berîka xwe û diçe mehkeme û evare te berdane.
Mela Siraceddîn jî girtîbû. Digot ku şütax avetine. Ji keç û bûkanre nivişt çekiriye. Levvra hatiye girtine, digotin. Niha, li girtîgehede ne zîkî van karan nedibû. Nivişten pir baş ji dest dihatin, le ji tirsa, nedi kir. Ji çend kesanre gotibû:
Ez nivişten gelek bi ceribandî dizanim. Le bele güneye. Levvra naxwazim binivîsim.
Heke ku savvcî bibîhîsta, edî xüasbûna wî nedibû.
Evv herdu gundiyen ku Soro dbcvvest bîne re, mehkema vvan piştî hefteke bû. Ev meheke ku bi dizî peran didine mela Siraceddîn. Jere tiştan dikirin, şirînayen xweş pe didine xwarine. Le dîsa jî nedihate re. Xwe kelogirî dikirin, dîsa nedibû. Mele di qowişa Soro vvande radiza. We şeve, dîsa hatin, lava kirin û giriyan. Xwestin ku Soro tekeve nava vvan û alî bike. Davviyede mele ji vvanre nivişt çekir. Le ye tu cara, ji kesîre tiştek negotana.
Bekir li ser ciye xwe, bin çavande meze dikir û dikeniya. Mele pi

şta xwe li vvan kiribû, qelem bi zimane xwe şil dikir û li ser kaxizeka piçûk tiştin dinvîsî. Bekir li ale Soro zivirî:
Soro, meriv çi dibeje, tu zanî? Heke ku dermane mele Siraced dîn hebûya vve bere li sere xwe bida. Wexta ku deve hakim giredide, evv xwe cima çend mehin girtiye?
Hefteke şûnde herdu gundî, di nav cendirmande, kelepçe di des ten vvande, dibcemgîn û bi pirçî vedigeriyan. Nehatibûne berdane. De ve hakim nehatibû giredane. Hatin hundir. Li ser ciyen xwe direjbûn. Kerr û lal. Hinekan je pirsîn ku mehkeme çilo derbas bûbû? Bersiven kin û be dil dan. Mele nehate cem vvan. Ber evare, li baxçe, di peş me lere derbas bûn û bi xeyd, dilsar li wî meze kirin. Mele çaven xwe revand.
256
Niha hemû tendûrekiya kem û zede bi girtiyen dinere hevaltî diki rin, hevdû dipirsiyan. Rind zanibûn niha, sûce ke çiye û mehkemen vvan çito diçe. Çend kes hebûn ku tendûrekiya, xwe ji vvan dûr digirtin. Ji bo esrar fýrotine hatibûne girtine. Caran diçûne vve oda piçûk, le ne gelekî. Hine rez û edeten girtîgehe rind fem dikirin û levvra ji be re betir rehet dijiyan niha. Evv rojen peşîn en tevvş derbas bûbûn. Reçûyina
Tendûrekiya baş bû. Ji gundekî gelek bi hevre bûn, vvekî male ke mezin bi hevre dijiyan, dibe ku levvra baş bûn. Kîjan be kef û bîra gund dikir, yen dine ferq dikirin û dihatine cem.
Dizanibûn ku yen nû tene girtîgehe, ya rastî nabejin. Piştî qedereke, ji hinekanre kirine xwe dizîkave dibejin. Evv jîji kesen bi bavverre.
Tu ji ke bipirsî, hemû li ser bihtan û şütaxan hatine vir. Yen bere, ve ya rind zanin, levvra kî nû hat:
Biraye min, tu sax û xweşbî. Xwede te xüas bike, çi bihtan avetine te? Digotin û jere re vedikirin.

Evva, sûce xwe, çi şütax ku avetine, hedî hedî dibeje edî. Hinek ci yen ku ne bi dile vvîbe, ser vvan deranre, bedeng derbas dibe. Evv ro jen peşî, hemû, bi kesîre napeyivin. Wekîqutiyen miftekirîne. Nav van bîst rojan, yen nû hatibûn û çend kes jî hatibûne berdane. Her tişt vve kî bere bû. Dîsa vvüo dihate xuyane ku yen ku meriv kuştine, be sûc bûn. Sûc her tim li ale ye ku hatiye kuştine bû. An rikefî li ser wî kiri ye, xüasbûn ku nemaye, lexistiye kuştiye. Anjî bi tehrekî din bûye. Le çilo dibe bira bibe, heke ku tu ji ye girtî dipirsî, evvana be guneh û be sûcin.

Tendûrekiya, ji bere xurttir bûn. Kes ne poşman bû û li ber xwe nediketin. Di girtîgehede çend kes dîtibûn ku di hundirde vvekî gören rîsîvedireşiyan.

Sûc davetin ser hevalen xwe. Paşe, evv hevalen tev hatî,

di hundirde dest bi şer û giliyan dikirin. Bi yekî vvisare edî ne henek dihate kirine, ne dihate xeberdane. Heviya vvan ku kem dibe, her be tir perişan dibin. Li zimane xwe nabine xwayî. Çi vvana hebe, giştan di bejin. Paşe bi tevayî ji ve zirar dibinin. Devven vvüo her tim nece diqediyan.

Çavva dest pe dikirin û wisa jî diçûn. Yen kevn. yen nû hatîji bo hale wisa her tim şîret dikirin.

Gerek meriv zimane xwe bigre. nevereşe, birano, digotin.

Ji Tendureke ve hefte xeberen nû hatin. Xale Mihe pere gund da bû abûqat Fiaî bege, paşe tu xera wî negîhîşte girtiyan. Gundiyan her roj sere wî kiribûn. Li kî dere rabûn û rûniştibûn, qala vî karî kiribûn. Mihe edî tamîş nebûbû. Be hevî mabû. Wekî kesen di xewede diðerin. Ji xenji gund terkkirine, tu re jere nemabû. Herdu jinen vviyen pîr, bi-

257

raye vvî, bi jin û zaranve ji gund derketibûn. Tu kes li ber çûyina vvan

neketibû. Geleken vvan jî duşa bûbûn.
Be qerare pintî. Kale tirsonek. Her tişt tevîhev dikir, gotibûn peyre.
Tendûrekiyen girtî j î vvekî gundiyen xwe, ji çûyina wî şabûn. Soro jî vvisa. Le bele, awqas salen direj, bi hevre cîrantî kiribûn. Davviya Mi he, kale beqerar, dile wî şevvitand di alîkî de. Tirsonek bû, gele tişt bereve nedidîtin, reyen nebaş dida peşiya cîrana. Le ji gelek aliyande jî, merivekî baş bû. Hale Marûfe küre Ûsiv axade, tu guhartineke baş tu nebû. Deve vvîji bere zedetir xar bûbû û diçû alîkî. Ji xeberdana wî qet tiştek naye femkirine. Yen ku di nexweşxanede evv dîtine, vvüo digo tin. We çendekî şûnde dermankirina elektrîke biceribînin. Hela he U nexweşxaneye. Kare gundî di riya xwede diçe, le zeviyen vvan îsal avvqasî ne baş bûn. Zede bilind bûbûn, le tede serî tunebûn. Heben ge nim ziravok bûn. Toxime çandî şûnve bistînin, evv jî başe digotin. Van xeberen ne baş he jî nerm dikirin, paşe digotin gundiyen vvan. nedbc vvestin ku girtî pir ber xwe bikevin. Li ale jina dîsa mîna bere bû. Ti ştek nehatibû guhartine. Seyîtxan edî bîra gund dikir. Kes tunebû ku pere bileyze. Ji vvir dûr nediket. Tu cî nas nedikir. Careke duda bi xaltiya Cevvahîrere çûbû mala vvan. Zaren cîranen vve, Seyîtxan hünedabûne nava xwe, pere nelîstibûn. Sekinîbû, dûrve leystiken vvan meze kiribû. Gog û tişten vvanen leystike, çi xweş bûn? Dile wî jî dbcvvest. Fate ji her kesî betir şabû ku Mihe ji gund çûye. Ne bi nav xelqe, le di nav hevalen xwede, «Mihe devgenî» digot, jere. «Çû, em je xüas bûn.» Pere û zeren ku dabûne abûqat dihate bîra vve, «ax devgenî» di got û tiştekî din nedihate bîra vve.
Hine şevan Esmer, bi dengekî nizm kilam digotin. Dema ku şaş û xelet digot, Fate alîkariya vve dikir. Fate di qîztiya xwede, ev kilam he mû baş zanibûn. Li yale xal û bave vve, dengbejen pir bi nav û deng he

bûn. Wilo digot Fate. Wexta ku xewa vvan direviya, çîroken duan, bûyine xwenen bere qal dikirin.
Hevala vvan sisya Gulîzar, ne bi vvanre bû awqasî. Kem xeber dida. Wexta ku dbcvvar, vedbcvvar, qise dikir te digot, li ve dine nîne, li dineke dine dijî. Gotin baş guhdarî nedikirin. Xwe nedida ser. Dihate kifşe ku di dile vvede, gele tişten tevîhev hene. Hela he gelekî be qerar bû. Levvra vvekî ker û gejan bû. Gelo, xwe bi xwe gunedar didît? Yen ku hatine sere vve, gelo ji rûye vve xwede nîn bûn? Gelo ji poşmaniye vvisa bû? Ji merivan be guman mabû, paşe ji herkesi direviya gelo? Ni zanim... Dibe ku ji van hemûyan qederek hebû, di nav dibcvvînbûna
258
Gulîzerede. Çîroka xwe ji kesîre nedigot. Dema ku je dihate pirsîne, «ne tiştekî ku be guhdarî kirineye, bihtan û şütaxeke hişk û valaye» di got.
Mere vve gelekî je mezintir bû. Oedera vve vvüo bû. De û bave vve evv dabûne mer. Zaren vvan bû paşe. Mere vve edî pir kal bû. Wisa te gotine ku Gulîzer bi yekî dinereye. Gulîzer û düketiye vve, dbcvvazin ku mere vve bikujin. Şeveke mere vve li male, Gulîzer kûçike ber derî dûr dbce û doste vve dikeve hundir. Bi mavzere ledbce kale feqîr dikuje û direve. Gulîzer xwe erde û dîvvaran dbce. Digrî û dinale. Pore xwe dirûçikîne.
«Ax mere min, wax mere min. Mere minî vvekî çiyan» dibe je û virda, vveda diçe û te. Kî û çito ketiye hundire male, kes nizane. Herdu çaven Gulîzere vvekî kaniyan. Dile gundiyan hemû pe dişevvite. Cîranan car caran bere, ji bo herda xeber didan. Gulîzera jinebî, feqîr û belengaza xwede. Çend meh derbas dibin. Doste vve naye xuyane. Hinek dikevine şike. Meraq dikin. Gundî ve çare, ji Gulîzere jî hedî hedî dikevine şike. Giliyan dibejin. Paşe vve bcbar dikin.

Girtina vve li ser ve şipe bûye. Le bele diðerin, nagerin, doste vve li tu deran nabînin. Hemû kesan rûye xwe ji Gulîzere vegerandine. Ji günde mere vve, ji ale bave vve kes naxwaze ku vve bibîne. Levvra her diçû diheliya, diçirmisî.
Zaren min jî, guh didine gundiyan. Nayene cem min. Li min napirsin. Min evv jî vvinda kirin, digot û digiriya.
Bi sehetan di quncikekîde wisa dima. Fate gelek caran pere dipeyivî. «Ji van şütaxen vik û vala tiştek dernakeve. Herkese davviyede ya rastî bibîne. Gerek meriv xwe bi xwe nexwe, nehelîne.» Le bele hemû gotin guhekî vvere diket û ale dinre derdiket.
Gulîzer sî, sîpenc şaliye. Xurt û li ser xweye. Rû û bedena vve bedevv û civvane. Bi awqas berketin û girî, dîsa jî bedevvbûna vve dihate xuyane. Di rojen xwene dibcvveşde, ji Seyîtxanre çîroke cin, periyan, mencasiye, qîzen padişahen bedevv, küren vvanen dijvvar qal dikir. Wisa serîn û ji dil digot... Te he dizanibû ku evv kesen çîrokan li peş te ne, tu li vvan diniherî û pere xeber didî. Gelek caran Seyîtxan dbcvvast ku çîroke ji serîde careka din guhdarî bike. Le fedî dikir jere beje. Esmere Seyîtxan dbcemiland, pore wî şeh dikir. Levvra gelek caran li dora Esmere nediqetiya. Cara, çaxa ku evv dbcemiland:
Seyîtxar, te min bistînî? Ere? digot.
Seyîtxan şa dibû. Şerm dikir, diçû xwe davete pist diya xwe, sere xwe direj dikir. Dbcvvast ku Esmer careka din jî wisa beje. Cendirme û gardiyan hemû ji Seyîtxan hez dikirin. Kînge dile wî bbcvvasta, diçû
259
ale meran. «Ape Soro, ape Mîro» digot û gazî vvan dikir. Seyîtxan hildidane
hundir. Le qet tu rojan, kincen vvane qirej ji diya xwere nehanî. Meran bi xvve dişûşt û nedidane. Careke kîsikekî peran dane. Bi

moriyen piçûk û bi reng rengî çekiribûn. Wisa şabû, wisa şabû. Zûti re reviya, hate cem diya xwe, Esmer û Gulîzere. Nîşanî vvan da. Seyîtxan bihîst ku li ale meran, guhe yekîjekirine. Ji tirsan çend ro jan neçû vvir.

Guhe yekî ku gundiyen xwe bcbar kiribû, hatibû jekirine. Du gun diyen xwe ûcbarî cendirman kiribû ku evv esrare çedikin û difroşin. Mehkeme gelek cezayen giran dane vvan herdu gundiyan. Li cem vvî xwe jî esrar dîtibûn, le bi cezakî sivik fýlitîbû. Li piştî qerare mehke me, girtî hemû şaş û metel man. Neheqîka mezin hatibû kirine.

Ye bcbar kirî, evare, li ser ciye xwe, xwe direj kiribû. Yek ji vvan gun diyen ku cezaye giran girtibû, bi kere rikefî guhe wî kir. Guhe çepe ji binve hatibû jekirine. Ev bûyîna li hemû qowişande nişkeva bû vvekî şayiya eyd û dîlana. Gundiye xwe îxbar kiribû û guhe wî hatibû jekiri ne. Girtî gişt duşa û bi kef bûn. Savvcî dest da ser bûyere. Kesî şahidî nekir. Kesî nedîtibû, nebihîstibû. Girtî, gardiyan û hemû kes. Hemû kes li hember wî bûn. Kesî alîkarî nekir.

Tendûrekîjî şaş bûn. Ji wî dûr disekinin. Bi çaven ne baş le dinihe rîn. Ye bcbar kiriye, guhe wî te jekirine. Serda jî qet tu kes şahidiye, ji bo wî nake. Evv jîşa dibûn. Eso û Hesen hate ber çaven vvan. Çend ca ra gundiye xwe bcbar kiribû. Gotinen vvan ji Ûsiv axare gotibû. Çi derseka giran bû ev. Kesen avvhare heqe jiyane nedidane. Qet ne li tu çi ya. Li derve, di hundirde û ne li tu cî. Dile kesî bi vvan nedişevvitî. Gü ne kesî pe nedihat. Ev bûyera, li hemberî kesen wisa hevdû girtina he mû girtiyan, gelek tişt hînî tendurekiyan dikir.

Wexta ku li gund, nexweş diketin, awqasî pir li ser nedisekinîn. Le niha li ve dere, baş hîn bûn ku di girtîgehande gerek meriv pir baş li sihete xwe binihere. Doxtir nayen, naniherin, talaşa kesîde nîne. Dîsa xera hevalen girtî digheje meriya. Gelek tişt ji deste kesî nedihat. Ro

jen direj, li peşiya vvan bû. Kî çi zane ku vve çi bibe û çi nebe? Levvra gerek sihete meriya li cîbe. Yen ku rind naxwin, xwarine dijberin ne baş bûn di hepsande. Xwarina xwe, heta pariye davviye xwarin... Ji vve şûnve jî ken, henek û bi hevre peyivandin... Ne vvüo vvekî dîna, bi her tiştî kenandin. Kenekî bi dil, bi hezkirin. Ne pirçî kirin û rû daketin. Kesî ev hînî vvan nekirin li girtîgehe. Jiyana vir hedî hedî evv elimandin. Her diçûn pere, pere digüûştin. Wan jî nizanibû, çilo dibe. Bi di lop dilop peşde diçûn. Di nav xwede, di nav vvan û girtiyen dinede ferq
260
dikirin ku her diçe, çûyineka baş hebû niha. Tendûrekî gelekî hatibû ne guhartine. Niha gelek caran ne bi gundiyen xwere, bi gundiyen di nere digeriyan, dipeyivîn û hevaltî dikirin. Bi vî tehrî dîtina vvan her diçû fireh dibû. Meriv û fikren nû nas dikirin edî. Ji bere zedetir fem dikirin û fireh difikiriyan niha.
Qet şik û şipe nedikirin. Heke ku bi tevayî hereket bikin, dibe ku bibine xwaye erde xwe. Hevî û bavveriya vvan, ji bere zedetir bû ku er de xwe ji deste Ûsiv axa xüas bikin. Dîsa jî bi hevîke peşde, tiştek tu nebû. Levvra ku hertişt li hemberî vvan bû. Niha, nezîkî nîve gund, ji bere pirtir bi hev digirtin. Ve zedetir jî tu tişt tunebû. Hemû nezanin. Be xwendin û be nivîsandin. Yekî reber tunebû di navde. Di her alî, be hevîtî dihate xuyane. Le di dile vvande, tiştek, vvekî gogeke rîse, her diçû mezin dibû. Dilfirehtî, sebir dida vvan. Wekî hevîka nû bişkive. Di girtîgehede pişta xwe dabûne hev. Qet kesek jî poşman nîn bû. Dbc vvastin ku tişten nû hîn bibin. Ev heviya nû, di dile vvande her diçû bejn dida. Car caran di nav xwede henek dikirin:
Ve girtine gelek tişt hînî me kir. Wek dibistaneye. Ne vvisane? digotin.
Niha ji bere baqütir bûn. Çav û hişen vvan tişten hinekî bere mezintir

hildida. Tişten mezin, le dîsa jîgora Tendureke. Dibihîstin ku li hi
nek günden dine jî sere axan dikin. Pir kefxweş dibûn. vvekî evv gundi
yen vvüo, li cem vvan û bi vvanrene. Bi salan bere evv gundiyen ku dijî
axa derketine, hatine kuştine, axan dest avetine namûsen vvan... Ke
sen vvüo, vvekî bav û kale xwe didîtin. Cara hela he jî nez.
Ji nav vvan hinek, kisike moriyan, tizbî çekirine hîn bûn. Di nava tasekede,
moriyen piçûk û rengin dijberin, bi tare dikin û dîsa dijberin.
Bi rojan şûnde kîsikekî gelekî xweş çedibû. Yekî, marek çekir ji mori
yan. Te dûrve le meze bikira, marek li erde, xwe vvalandiye û razaye.
Te digot ku marekî raste. Pazbende milan çekirin. Nave hevalen xwene
gund li ser nivisîn û ji vvanre şandin. Girtîgeh niha ne cîkî wisa bû
ku nehata kişandine. Le ve dere hinek tişt hebûn ku aqüe meriya hilnedida.
Hinek girtî, wexta ku mehkemen vvan hela he neqediyaye, dest
ji nimeja xwe ne dikişandin. Le heke ku ceza bistînin, cezakî giran bigrin,
dest ji nimeje dikşînin. Oet tiştek naye bîra vvan. Tiştekî nafikirin.
Le hinek jî ne vvisane. Berî cezagirtine nimej çiye nizanin. Paşe
misine vvan di destde, kumekîşofîtiye li serî, sere vvan ji nimeje bilind
nedibû. Nizanibûn ku ji van herdan kîjan raste. An herdu jî şasin.
Di bin ciye Soro, yekî keçel radiza. Dizî kiribû. Her roj, «sere min
dieşe, pişta min dieşe» digot. Dermane eşe dida kirine. Te diniherî du
261
roja sere xwe bilind nekiriye û razaye. Kesî evv be kef û hişyar nedikir.
Dema ku pere wî tunebûn an jî hevven eşe nehatibûna kirine, bi hers
û qehr diçû, dihat. Tevî lîstiken dama dibû. Dest pe dikir digot, «ez
nexweşim.» Dest, piyen wî dikişiyan. Bîhnteng dibû. Çaven wî le bûn
ku ji cî derkevin. Yen qowîşa piçûk, zanibûn ku cima wisa dibe. Ji berîken
xwe tiştek derdbdstin û pe didane vexwarine. Oaseke şûnde di

hate ser xwe, tiştekî wî nedima û duşa dibû. Dîsa dest bi xewe dikir. Tendurekiyan bere ji ve nexvyeşiye tirsiyan û paşe evvjî hîn bûn. Feqîra ji küre bizanibûna?
Di nav xwede, li ser rojen ku peşiya vvane xeber didan, hertim. Di davviye ve devve, di peyji girtîgehe derketine, vve reke çavva bigirtana? Gişta jî dbcvvast ku bi hevre hereket bikin û li peş axe bisekinin. Qerare vvan qerar bû. We li erde xwe bibûna xweyî. Zivirandin edî nedibû. Re wisa nîşan dida.
Yen hundir jî dbcvvazin, mînanî yen derve bijîn. Se, çar gava vvede yek radize, dema ku te cem hevale xwe, ye ku di binde radize, vvekî ji gundekî dine çûye bajarekîdine. Wüo mevan te qebûlkirine. Li ser cî, ale jorîn te rûnişkandine. Balîfan didine ber milen vvî. Bi hatine, li ser lingan disekinin, diçine peşiya vvî. Li male çiloye, li vir jî vvisa. Cbcare ten girtine, paşe çay û şerinayî. Kef, halen hev dipirsin. Xeberdan di hatin li ser tişten ku mevan je hezdikin. Dema ku diçû, dîsa vvekî gund, bajer dibû. «Bi xer û silamet herin. Ser seran, ser çavan hatin...» Bele vvekî dervaye girtîgeh. Dûr, direj nakişine, paşe ye dine te mevaniye. Heke ku mevan ji qowîşeke herine qowîşeke dine, her zede mevantîke girane. Çend kes bi hevre diçin. We roje, xeberdanen vve mevantiye, xwarin û vexwarine vve, rojtira din di girtîgehede te qalkirin. Diha te kifşe, kî ji ke hezdike an jî diqehire.
Şîv çekirin. Savar û pîvaz li cem bû. Kevçiyen darînî, yek diçû û yek dihat. Sibe zû, herkesi nanek didane. Nîvro tasek girar, nok an jî fasolye heqe vvan bû. Pir caran be rûn û baş nekeliyabû. Caran riz dida ne. Hine rûn, pamador û îsot be tev kirine, vve çaxe te xwarine. Pir kes vvisa dikin. Hineken qowîşa piçûk, yen ku hale vvan baş bûn, nîvro jî xwurek çedikirin. Beroşa vvan dikeliya. Caran goşt jî dbcvvarin. Bîhna goşt dihat ji dûrve. Dûye mitbaxe, behna kuçiken nifte û xwurek vvisa

tevî hev dibû ku yen vvir ji sereşe xüas nedibûn.
Hertim qerar didan ku kuçiken nifte, di qowişande negrin, le bele tu cara wisa nebû.
Şeve gardiyan te û girtiyan dijmire. Di girtîgahande gardiyan vvekî qiralane. Bira gardiyan doste tebe, beşe. Tu edî rehetî. Gardiyan ku
262
dikeve hundir, kal û xort hemû radibine ser piyan. Denge xwe dibirin, li heviya jimare disekinin. Kare wî ku diqede û diçe qowîşa dine:
Xwede vve xüas bike hevalno, dibeje. Girtî jî:
Xwede ji te razîbe. Tu bijî. Amîn, bersive didine.
Girtî wisa ji gardiyana ditirsin ku ji xwede jî vvüo natirsin. Ke tişte kî ne baş kir, dibin û dikutin. Bi cendirman didine lexistine. Tî û birçî davetine ciye sar û tarî. Sergardiyan nedbcvvast vvüo bibe, le dîsa jî gardiyanen
dine, van edeten xwenen kevn kar dianîn. Xwuregen baş be çekirine, anjî bi rojen dîtine hingiv û to ji vvanre be, tu cara para gardiyanan
ji bîr nakin. Cbcaren giranbiha. Qet nebe çend rojan careke, paketek. Nivîsdare girtîgehe, pirîn diçû qowîşen piçûk.
Her şev hinek dama düeyzin, hinek kilaman dibejin û guhdarî di kin û hinek jî di nav xwede dipeyivin. Ji vvan çend kes hene ku du se şeva careke kom dibin. Nusret efendî, bere di belediyede endamî ki riye û vve jî pir caran tîne bîra yen li dora xwe. Neh, deh kesanre qalâ hespe hezretî Elî, dildule û züfîqare dikir. Dema ku hezretî Elî gürze xwe ba dikir, seren çil kesan ji pe dikir. Çîroken periyan. Yen çiyaye Qafe. Yen li dora vvî, vvekî ku di xewnedene, pere diçûne sere hezre tî Eî û çiyaye Qafe. Nusret efendî ji küre awqas çîrok zanibûn? Pesne bedevvbûna qîza periye penc deqîqa dikişand. Ava deve guhdara di

çû edî.
Du meh bûn ku girtibûn. Xwede zane vve he çiqasî di hundirdebin.
Di nav tendûrekiyande xeberdaneke dileşandî û meriv şikestandî çebû vve roje. Bere du kesan di nav xwede qise dikir. Paşe hinek tendûrekiyen guhdar jî tevî bûn. Hemûyan edî dîtinen xwe digotin. Yekî
xort:
Gundiyen meyen din, ji tirsa cane xwe, du salande nîve gund vala kirin û çûn. Ciyen bav, kalen xwe, gören vvan terk kirin. Ev eybeka girane. Qet fedî nekirin? Heke ku em erde xwe şûnve bistînin, evv be ne jî, diya min jina min kiribe, em nanelin tekevine gund, digot.
Oro, lo birao. Tu çavva wisa dibejî? Çavva em naneline gund? Ne evv jî gundî û doste mene. Awqas sal em tev neman cima? îca em çi bikin, vvan ku lexist çûn? Bele ne baş kirin ya rastî. Gerek neçûna. Le dema ku şûnve hatin, gerek em vvan bi biratî û cîrantî qebûl bikin, bersiv da Seît.
Ye xort ve çare, betir qehirî.
Le, dema ku vvisaye, gej û be aqüe dine emin cima? Di qereqolande be kutane, li gund pariyek nan ter nexwin. Di girtîgehande be-
263
lengazbin. paşe jî tirsonek û be xîretanre «keremkin vverin, fermo vaye erde vve» bejin. Bira neçûna.
Oasim bi nîvken kete nav xeberdanen vvan.
Lo lo. Hela le. Ez diniherim, vve her tişt xüas kiriye... Gund di deste vvedeye. Niha jî maye derden yen çûyî. Hûn xwede, ye vve jî aqile niha. Ve gotine ji herduya jîgirt. Bere Seît xeber da:
We çi bibe, le? Tu eme heta mirine virabin. Qet eme der neke vin? Em van erdan tu cara bi Ûsiv axa nadine xwarine. Tu çi dibejî, ere?

Ez jî vvek te difikirim. Le bele, bila hela evv roj bene. Evv kare paşene.
Evv xorte, bi serîde xeberdan vekiribû, peşde hat:
Evv kare paşeye, maşeye tüne. Him li ber cane xwenen şîrin bikevin, him jî em erde bidine vvan. Ji bo vvan began nizanim çi bikin?
Hema ez na, kî ve qebûl dike? Heke ku hûn wisa difikirîn, hema di se rîde, hema ji îrove bejin, bave min.
Yen nû hatî tevî peyivan bûn. Hema hema hemû tendûrekîkom bû bûn. Li qowişe, ser ciyan, xwe sipartibûne hev û qise dikirin. Soro xwest ku hemûyan guhdarî bike. Yen ku ji bo cîranen çûyî ne baş xeber didan du, se kes tene bûn.
Heke ku neçûna, dibe ku betir hesan bibûya kare me. Sere axe awqas giran nedibû. De vvere, evv xale Miheyî genî bîne bîra xwe. Pe ren me avetine ave. Him jî çiqas pere? Du sed zeren zerînî. Tu me he mûyan bigerî, jin û mal, du sed zer dernakeve. Tirsonekî kîz kîzok. Da vviyede revî, çû. Bira gora xwede here. De vvere beje. Ana em bejin ku me zeviyen xwe bi dest xistin. Ware xale Mihe, evanan jî yen tene. Eme vvisa bejin?
Bele. Gotina teye. De beje me cima gura wî kir? Em cima li pey çûn? Ere? Cima qet sûce me tüne? Me gotina wî nekira. Ke bi zore dida kirine? Na. Ya rastî, kemasiyen me hemûyan hene. Evvî jîji neçarbûna
xwe dikir. Tu dijmine me bû. Tu şirîke abûqat nîn bû ez di bejim.
Qasim ev pirs digotin û nebirî:
Yen çûyî, reka dine nedîtin, levvra çûn. Bi dile xwe neçûn. Me riven gelekan, hela di nav medene. Ye te tunenin? Xaltiya te lu kuye? Ne li Oonyeye? Le zave te cima çû? Xwîşka te vvekî hesiran digiriya.

Nedbcvvast ku ji vve biqete. Te çi zû ji bîr kirin? Hela em zeviyen xwe şûnve bistînin. Derde me evve. Kî dide me erda, zeviyan? Ere kî dide
264
me? Hukumat an Ûsiv axa? Ya rastî gerek em ji bo ve yeke, bi dest û neynûkan bbcebitin. Kare giran eve.
Tu vve ji hişe xwe dence Oasim. Diya min jina min kiribe ku ve girtîgehede deh salan jî razem... Bîst salan jî. Le eze dîsa jî zeviyan şûnve bistînim. Cima hûn ne vvisanin? Ye ku vvüo nafýkire heye di nav mede? Hûn vvüo nefikirin jî, edî derbas bû her tişt. Eme sere xwe bi dine şikenandine, eme seriyan bişikenin. Le eme dîsa jî erde xwe bigirin. Le bele vve çaxe, qet bihustek erd jî ne para yen cîranen çûyine. Wexta erd zede bû, eme di nav xwede parvekin. Erde zede çaven ke derdbce? Ke gotiye ku erde min zedeye, eva ji minre beşe, ve dinede? Hela ji minre bejin, ne wisane?Seît xwest ku bipeyive. Le dît Mîro dilipite ji bo xeberdane, deng nekir. Pirs ya Mîro bû niha.
Birano, tamîşbûna hemû kesan û sebra vvan ne yeke. Hiş û aqile vvan ne yeke. Yen çûyî tamîş nebûn û sebir nekirin. Ji desten vvan awqas dihat. Le em hevdu digirin, dest didine hevdu. Dbcvvazin ku ze viyen xwe ji dest dernexin. Dibe ku em bikaribin jî. Di vî halî eme du tiştan bikin. Yek, eme merg û zeviyen xwe ji deste Ûsiv axa denrin. Ya dudan, eme him bi gundiyen xwene çûyînre, him günden cîran, der doranre nîşan bidin ku me bi sebir û dest hevdayîev kara bire serî. Ez bejim me erd ji dest Ûsiv axa dendst. Wekî em erden yen çûyî di nav xwede parvekin, vve çaxe ferqa me û Ûsiv axa çiye? Em dibine xwaye erdekî ku ne heqe meye. Ûsiv axa jî vviloye. Levvra, em çi bikin, eme bi derd û kul di hepsande bimînin... Diranen Tahir yen bene şikandine. Le pey yen çûyî, em nikarin avvha bipeyivin. Gerek em her zede dilfireh bin. Em nikarin neheqiye bikin. Me neheqî dîtiye, em çilo ji

bo xelqe qala neheqiye dikin? Ev ne kare meye. Neynûken Soro jî ha tin kişandine,
Ewxort û yen ku dbcvvastin erde cîranen çûyî parvekin, zivirîn li ale Soroûje pirsiyan.
Tu çi dibejî Soro?
Soro li ruyen vvan niherî û dest pekir:
Ji bereve tivdîr sitandin tiştekî başe. Meriv gerek hine tiştan he la he nehatî bifikire. Dema ku hek te ber qûna mirîşke, dike qarînî. Ya rastî ev ne rinde. Gerek meriv ji bereve bîne bîra xwe. Ye me jî vvi sa. Me dîtina hev guhdarî kir, bihîst. Ez wisa zanim ku ji vî alîde baş bû ev peyiva nýe îro. Hela he em nizanin ku erde me, vve deste me ke ve an na. Le wisa te xuyane ku em vvüo bi hevrene û bi qerarin, eme davviyede le bibine xwayî. We çaxe eme xuliye bavejin ser van rojen belengazî û tedayî. Van du salen derd û kul. Hûn dibinin ku çi ten se-
265
re me. Hela he vve bene jî. Tişten vver bûn ku kesî texmîn nedikir. Yen çûyî çûn. Yen mayî bi qasî dîtina xwe U hemberî axe derketin. Yekîtî û bi hevrebûna me, ya rastî gelek rind bû. Kesî wisa hevî nedikir. Em gişt nezanin. Feqîrin. Nasen me ne di hukumate, ne jî li bajer hene. Em peran bejin, evv jî tunin. Me baş an xeraw hanî heta vir. Em li vir hevde kesin. Girtiyen din hemû ji mere başin. Ji me ne acizin. Em vve kî birane. Le Fate. Mere vve tüne. Küre vveyî mezin tüne. Ji me hemû yan zedetir feqîre. Ke dîtiye ku awqas derd bene sere jinebiyeke? Ci ma ev ne li ber çavane? Ya rastîçend hevalen me gelekî qehirîne. Levv ra îro, ji bo yen çûyî wisa xeberdan. Heqe vvan jî heye, di alîkîde. Ez texmîn nakim ku çaven vvan di erden yer. çûyîde bin. Evv naxwazin ku be zehmet, be teda cîranen çûyî bene li ser erde xwe rûnin. Ez avvha texmîn dikim.

Cîrane vvanî xort tamîş nebû:
Bele, bele. Ez levvra diqehirim.
Soro dîsa dest pe kir:
Ye bûyî bûye. Ye çûyî çûye. Me nikaribû vvan bidine sekinandine.
Ye çû nede dû. Me lava kir, me deh caran ji vvanre got, le nebû.
Evvjî ne bi xirabiyen xwe çûn. Tu reka dine ne dîtin, levvra çûn. Li ci yen çûyî, geleken vvan jî, pir perişan bûne. Birçîne. Em ji vvan belengazin, evv jîji me. Evvjî mînanî me nezan û feqîrîn. Wisa fem kirin. He zanibûn ku çûyin ji vvanre vve başbe. Em çavva bikin? Wisa bû. Ji vir ha bifikirin, niha. Nedine li pey ye çûyî. Em ji vvan derse bigrin, evv jî besî meye. Ji du bira yek kar dike û dbcebite. Biraye dine jî, ji ve kede dbcvve. Ne vviloye cima? Ji bereve vvisane. Gelekî ber nekevin. Evven çûyî, herkes di jiyaneke nûdene. Bi tehrekî nû, re diçin û dijîn. Texmîn nakim ku gelek ji vvan şûnve ben. Heke ku ben, ser sere me û ser çaven me ciye vvan heye. Niha hûn ji vir derketine û paşe eme çilo bi kin, vve bifikirin. Kare meyî îro evin.
Giştan heq dane xeberdana Soro. Evv xorte pir diqehirî jî bi tevre. Firehbûnek hatibû dile hemûyan.
Bihar zûtire derbas bû. Tendurekiyan nikaribûn sere xwe bbcurînin ji ber bûyeran. Küre Ûsiv axa, Maruf, nişkeva vvekî babeliskeke, di na va gundiyande mabû, le bû ku bihata kuştine. Ji ber mirine füitîbû. Dûr, direj di nexweşxanede mabû. Mile wî kiribûne alçiye. Le derde vvî, ne ev bû. Kula wî ser eş û gejbûna wî bû. Wexta ku sere xwe bilind dikir, li eniya vvî, te digot ku çaven wî dikolin. Hişe wî diçû. Tu derma na jî kar nekirin. Ji bere zedebûn evv eş. Paşe hedî hedî kem kirin, le ve çare jî zimane wî giran bûbû, nikaribû xeber bide. Maruf ku nika-
266
ribû qise bike, her diçû diqehirî. Dema ku wisa diqehirî, zimane wî be

tir divvaliya û qet xeber nedida. Te digot ku kevir tijî deve wî kirine. Ne dbcvvast ku kes wî di vî halîde bibîne. Levvra yen ku dihatine dîtina vvî, hale wî dipirsiyan, nedbcvvast vvan bibîne û pere xeber bide. Ji des te wî bihata kes nezîxwe nedikir. Car cara hersa wî ji bave wî dihat. Ji ruye vvîde ketibû vî halî. Çer û xeberen wisa ji gundiyanre digot ku he tanî niha kesî ne bihîstine. Wan hindik mabûn wî bikujin. Lexistin ne bes bû, îca niha deve wî jî xwar bûbû. Niha vvekî merivekî nîvcî bû. Zû zû diçû li peş neynike, li xwe diniherî.

Ez bimirama, ji ve çetir bû. Tehre merivan bi minre nemaye, di got.

Doxtir her roj dihatin.

Hela pif bike. Pif bike. Hela bifîtîne, digotin.

Maruf dikir ne dikir nedibû. Dbcvvast ku bifîtîne, le leva wî ya xwar, nedihîşt. Doxtiran:

We başbe. We başbe, înşalla digotin.

Te digot ku ji oda Maruf direvin. Bere Maruf çiqasîhîviya doxtiran bû ku zû zû bene cem. Le niha nedbcvvest ku rûçike yekî jî bibîne. «Ji vir derevvan peştir tiştekî nabejin» digot Maruf. Jina wî li ba, berketina dile xwe nîşan nedida. Le dizîkave digiriya, her roj. Ji bo xezûre xwe tiştek nedigot. Le dîsa jî, mere vve fem dikir ku dile vvede derbas dibe, «ax te ev belanan anîn sere me, te mala me şevvitand.»

Oaseke ji oda Maruf dûrkeve, mere vve xûlî dibe, diqehire. Wexta ku nikare xeber bide û gazî jina xwe bike, he zede di ezmanan diket. Meh nîvek şûnde, mile wî ji alçiye dendstin. Car cara meraq dikir, vve ve alçiya mînanî keviran, çavva ji mile wî dendn. Bi meqes û keren mezin hatin û alçî vekirin. We çaxe Maruf vvekî zaran şabû. Xwest ku mile xwe direj û rast bike. Dieşiya û wisa nedibû. Gelekî ber xwe ket. Le bû dîn bibe. Te digot ku najî, di xewedeye. Hine merhem tedan.

Fîlimne nû kişandin. Dil û bîhna wî teng dibû. Doxtir filim di deste xwede bilind girt li berve tîrje, paşe nîşanî Maruf jî da.
Rind cebiriye. Rind girtiye. Qet tiştek nemaye. Ma rastbûna mi le te. Evvjî di deste tedeye. Her roj, hedî hedî gere vebe. Bi zore na be. Te bibînî, meheke şûnde, vve gelekî vebe.
Doxtir bi Maruf hîn kir ku vve çilo bike. Hine derzî, derman dane û şandine male. We rûye xwe ji serme, sure bipareze. Baye sar jere ne başe. Destmalen germkirî vve bida li ser lev û rûye xwe. Heke ku heta meh nîveke berve pakbûne neçûya, vve dîsa bihata cem doxtir. Raporeke direj ji savvcîre şandin.
267
Hevde gundî girtine. Hale Fata belengaz meriya dihelîne. Küre vve li ba xaltiya Zelexayeye. Hesreta diya xwe dikşîne. Kar û peşen girti yan di hustiye cîranande maye. Her hefte çend kes tene dîtina girti yan. Naye kişandine. Pere xwe hemû dabûne abûqat. Kesî careka din jî rûye wî ne dîtibû. Heviya giştan zeviyen vvan bûn.
Zevî, bi bejna merivan bilind bûn, le tede hevv tunebûn. Te serîk simbil bipişiranda, se, çar genimen ziravok je derdiketin. Hevde gun diyen bi can û quwet hundirde bûn, levvra yen gund mayî dbcvvest ku her zede kar bikin. Şev, roj nedigotin. Kar dikirin. Kemasiya cîranen xwe, li malen vvan nedane nişane. Bere kare malen girtiyan dikirin. Ji bo xatire kaye, kam dajotin. Tede genim pir kem bû îsal.
Piştî bederan, toxime par avetibûn, şûnve hildan an jî hilnedan. Ji bo xwarina vvan genim nemabû. Gereji der bikirîna. Saleke meriv, heyvvan,
cot û zevî, awqas zehmet gişt badilhevva çû. Tiştekî avvha nedîtibûn. Li vanderan qet vvüo nedibû.
Ûsiv axa Şukrî şand, heqe xwe, para xwe, jî gundî xwest. Ne dihat

û li ser bedera nedisekinî. Le bele gerek vvana jî heqe zeviyen wî bişan dana.
Gundî, Şukrî bi deste vala şûnve şandin. îsal çi hildabûn ku çi jî bi dine Ûsiv axa, digot gundî. Wan rojan di derde. küre xwe ketibû, levv ra careke din jî li ser nesekinîbû Ûsiv axa. Wilo nîşan dida ku wexteke bi dile xwe dipîviya. Le xwe jî zanibû ku kesî tiştek hünedaye îsal. Haya Fate û girtiyen dine je hebûn. Tu tişt ji deste vvan jî ne dihat. Hela kane çilo diçe? Maruf bi jîpeke hate gund. Tu kes ji gundiyan neçûn dîtina vvî. Ji xaltiya Zelexanere hürmet dikirin, tiştek nedigotin, levvra evv çû mala Ûsiv axa. Wexta zivirî û hate nav malan, jin û meran dora vve girtin, Maruf je pirsiyan. Evve jî pirçik pirçik digot. Gotinen Zelexaye, vvekî bihîstinen vvanen bere bûn. Maruf nikaribû baş xeber bide. Deve wî xwar bû, di alîkîde dikişand. Te digot ku hemûya çûne bi çaven xwe dîtine. Giştan qala Maruf dikirin.
Ne Ûsiv axa gundî dipirsiyan, ne jî gundî Ûsiv axa. Herdu alî jî ketibûne derden xwe. Dbcvvastin ku ev dema bira vvüo derbasbe. Dîvvarekî bilind di nava herdu aliyande hebû. Dîtin û bavveriya vvan ji hev du pir dûr bû ana.
Bihareke direj, havîneka xweş hat û derbas bû, ji ser vvanre. Tu ke sî tiştek je fem nekir. Tam hilnedan. Rojen îsal, gişt bi derd û kul bûn. Nepakî û xezew li ser hev dihatin.
Ji günden dore, axa û gundî dihatin, ji bo dîtina Maruf. Qefle qefle siyar û peya mala Ûsiv axa bûn mevan. Tendurekiyan ji ber dîvvaran,
268
li ser xaniyan, ji dûrve meze dikirin ku yen hatî nas bikin. Qet dile vvan ji kesî nedima. Li vvan deran edet û dîtin vvisaye. Rojen avvhade, dijmintiya
xwe ji bîr dikin. Sencvveşiye didine hev. Diçine malen hev û

ten. Şermeka girane heke meriv vvüo neke. Dereng nemayî û zûtire hevdu pirsîn, heviya hemû kesane.
Herdu alîjî, di dile xwede tenebûn, bekesî didîtin. Awqas kes diçû, dihat, le Ûsiv axa xwe di nav vvande vik û vaîa dihesiband. Wekî kese kî li beriye, bi xwe sere xwe mayi. Dijvvarî û sere van du salan tu kareke mezin ne gihandibû Ûsiv axa. Xelqe male jî bi hevre sar bûn. Ma ruf ku li rûye bave xwe dinihere, ne vvekî bereye. Bi dost, germ, dibcvveşî nanihere niha. Bere xwe bi dîvverde dike, «xewa min te» dibeje û bi sehetan naxwaze ku bi kesîre xeber bide. Di demekî kurtde te di got kal bûye. Yen ku hatibûne sere wî pir giran bûn, nedihatine kişan dine. Meriv diheland û dirizand. Rizandina Maruf, ji bedena wî zede tir di ruhe vvîde bû. Bi çavekî tarî û bi dilekî sar li kesen dora xwe û ji yane diniherî. Neheqîke mezin dîtibû. Hetanî davviya emre xwe, ne dbcvvast vvüo merîkî nîvcî bimîne. Xwarin pak nedbcvvar, be mede bû. Diya vvî:
Ez qurbana teme. Te ji ve xwarine pir hez dikir. Gelek caran dbc vvast. Cima naxwî niha? Tu ji nexweşxane nû derketî. Ji bedena tere dibe xwîn. Te zûtire beyî ser xwe.
Ez çilo bikim? Mede min tüne. Dile min naxwaze.
Le Maruf. Cane xwe, bedena xwe bîne bîra xwe. Vî tehrî, bi ne xwarî, te paşe çavva bibî?
Bi zore nabe daye.
Wisa ku digot, xwîh dida û zehmet dikişand. Diya wî gotinen Ma ruf bi zoreke fem dikirin. Vî halî Maruf evv her dida qehirandine. Ûsiv axa fem dikir ku Maruf vvekî bere ji wî hez nake, je dûr dike ve. Levvra Ûsiv axa ber xwe diket. Çend caran li cem küre xwe, dûr û direj rûdinişt. Dbcvvast ku dile wî hilde. Nedigot, le bele, meriya ferq dikir. Niha nava kur û bavede kaşen kûr hebûn. Bere bi dil û can ne

zî hev bûn. Bave ji kur hez dikir, kur jîji bavere hürmet dikir. Gelekî bi hev bavver bûn. Niha li ser bendeki zirav mabû tekiliyen vvan. Evvjî li ber qetandine bû. Maruf nedbcvvast ku bave xwe bibîne. Wan rojen peşiye, Ûsiv axa dilfirehtî nîşan dida.
Ev Marûfe me, çiqasî pirçiye xwe dike? Rûye wî hertim tirşe. Tu dibejî ku min evv birîndar kiriye.
Evvjî hedî hedî ji küre xwe sar dibû û dûr diket. Je hez nedikir. vVekî bere, edî dile wî pe nedişevvitî.
269
Peşiyan gotine ku «rojen jimar zû derbas dibin». Raste. Meriv hînî çi nabe ku? Evv halen herî giran û be hevî jî... Ye ku mînanî însanan xwe biguhurîne, nehatiye dine. Se mehen tendurekiyan qediyan ku di girtîgehedene. VVekî duh na per. Her roj yen nû hatî û yen ku tene ber dane. Bûyeren nû û kesen nû. Ne niha, le dibe ku paşe, girtîbûn neye kişandine. Meriv tamîş nebe. Bi hevrene tunebûne nakişînin. Seven girtîgehe. Kilam, çîroken Nisret efendî, leystiken dame. Di navxwede henek û xeberdan...
Çi kesen cure bi cure hene li vir. Hinek hebûn ku jîr û dijvvar bûn. Bavverî û heviyen xwe vvinda nedikirin. Hevalen dora xwe dipirsiyan. Hürmet didîtin di hundirde. Bi derden hevalen xwere mijûl dibûn. Yen xwe bîr dikirin. Du rojan careke rûye xwe kur dikirin. Te digot ku vve sibe bene berdane. Kincen xwenen paqiş li xwe dikirin. Hertim tişten baş difikirîn. Cara xenji cbcare, hînbûne wanîxirab tunebûn. Ça vva haya vvan dibû, kesî nizanibû. Pere û cbcaren ke nemaye, dîtiyen ke nehatine, vvan rind ferq dikir. Gardiyan û memûren girtîgahe jî, bi ke sen avvhare hürmete nîşan didin. Hineken dine hene. Por û ruye vvan bi tevî heve. Kirase ser vvan qirej û di bîhnedeye. Di piştde, ji bo her kesi xeber didin. Naxwazin ciye xwe jî berev bikin. Gardiyan hertim ji

vvanre pirsen nebaş dibejin. Sere vvan di berdane. Kem xeber didin û nakenin. Di dineke reş û tarîdene. Rojen şayî û xweş naynine bîra xwe. Tendûrekiya ferq dikir ku vanen davviye, yen peşîn hez nedikirin. Di paş vvande xeber didan. Dbcvvastin ku hemû girtî vvekî vvan be tevdîr û perîşanbin. Şev û roj gişt li cem hev bûn. Levvra meriya, kesen baş û xeraw rind ji hevdu dijbart. Ye peşîn dîtiyen xwe duşa û xurt dikirin.
Le ye paşîn, dile vvan dişkenand û xemgîn vedigerandin dîtiyen xwe. Tendurekiyan, ji gardiyanekî bihîstin ku savvcî di davviyede kes gunehkar nedîtibû.
Gundekî bi tevayî eva suca kiriye. Hemû gunehkarin. Gişt dibe jin ku bi tevayî kevir havetinc û bi daran lexistine. Ez ji ku û çilo bizanibim ku ke birîndar kiriye? Savvcî wisa gotiye.
Gazî gardiyan kirin, çay û cbcare dane peş. Hine pere reqî û şerabe kirin berîka vvî.
Di serîde jî tendûrekiya texmîn dikir ku vve vvüobe. Le paşe tiştek derneket di ale berdana vvande. Savvcî ji der dora xwere avvha gotibû. Le dîsa jî meriv nikare bi vvan bavver bike. Li ser ve xebere, tendûre kî şa bûn. Her roj edî qala gund û zeviyen xwe dikirin.
Ax, me zeviyen xwe şûnve bigirta careke.
270
Me bikariba Ûsiv axa ji gund dendsta, berda vvî, digotin û dest bi gotine niyeten xwe dikirin.
Devven girtiyan, gelek caran dûr anjî nezîk, bi merg, çayir, zeviyanve giredayî bûn. Li ser erde şer û güîkirin, bi salan kişandiye. Hinekan be heq, zorbetî dest daye ser erde cîranen xwe. Bi salan devve û mehkeman,
kiş kiş kirin. Li berî hev dayin. Bi vî tehrî, kîjan kevirî radikî, di binde sere erde dihate xuyane. Anjî seren di nav gundiyan. Di binve

kûr bûne û nişkeve xwe rûye ave xistine.
Di qowîşa sisya, ya mezinde, ji gundekî, çar pizmam hebûn. Li ser erde, nepakiyen mezin bûbûn. Bûyeren ne baş ketibûn nav herdû ali yan. Beriya Tendurekiyan hatibûne girtine. Dema ku nû hatibûn gir tine, abûqate vvan careke hatibû dîtina vvan. Carek jî pey vvere. Ji nav vvan ye herî zana û çav vekirî Cimşît bû. Kem, zede tirkî fem dikir. Diranen vvî yen peşîn zer û yekî bi goşt û qelew bû. Giran giran xeber di da. Evv dişandine cem abûqat. Her çar bi hevre nediçûn. Ji abûqat û gardiyananre jî wisa hesa dihat. Cimşît ku çû ba abûqat, bi ser linga, hal û çûyina devve je pirsî. Abûqat tiştin got, le bele Cimşît fem nedi kir. Fedî kir ku careke din jî je bipirse. Tiştek tene fem dikir. Abûqat digot ku «çûyina devve normale». Dema ku Cimşît vegeriya ciye xwe, pismamen wî û yen dine ku je dipirsiyan:
Nizanim vvalle. Dibe ku normale. Le bele ez nizanim, «norma le» tu xerî an serî. Min je pirsî, abûqat dibe her tişt «normale». Hinekan got, «normal» pir başe, hinekan got, ne xerawe. Paşe du kes ji vvan çûne ba sergardiyan, je pirsîn. Evv jî dikeniya.
De hema, çilo hûn zanin. «Normale» lo.
Paşe xwast ku bi tehrekî din ji vvanre beje.
Wisane ku bi re diçe. Çilo hûn difikirin, vvüo diçe. Di alîkî da jî, mena vve evve ku «başe». Ya rastî ne xerawe ha.
Lo Cimşît ez heyran. Te cima ji merik baş nepirsî?
Ez çi bipirsim? Deve xwe vekir got, normal, girt got normal. We niha rind fem kir. Sergardiyan ji vvere got, edî hûn çi dbcvvazin?
We çaxe Mîro hate cem vvan. Dikeniya. Ev bûyera ku ji Xalisre di gotin, Mîro dîsa kete nav xeberdanen vvan:
Bi dîn û îman, dîsa jî başe. Binher qet nebe, merik te. Hûn fem nekin jî dîsa dibe «normale», paşe diçe. Ev çend çare te abûqate vve?

Ev cara sisiyane.
Walle, bille rast dibejim. Meze bikin, me çiqas pere daye. He
ma hema pe çara yek, gundek te kirine. Qet rojeke li ruye me neniherî.
Gelo em mirin an man? Qet telaşa merik nîne.
271
Deste xwe da ser pfle vvî.
Ax. Ax. Careke nekeve ve tele. Meriya vvekî pîvazan be qalik di
kin. Wekî zolen çarbcan zirav dikin. Bexte vve heye ku devva vve baş di
çe.
-XXXVIHevalen
Tendurekiyan bi tehr tehrî bûn. Yek ne mînanî yen dine
bûn. Evv rojen peşîn, hevalekî Soro hebû. Bi hevre vvekî bira bûn. Ge
lek nase wî hene li bajer. Gelek der dîtine. Salen wî zede tene xuyane,
le hela he nezevviciye. Zana dbcuya. Ji her dere tiştek hîn bûbû. Ji Sorore
digot ku heqe vvane, gerek heta davviye sere axe bikin. Hevalen
xwe jî wisa bide bavver kirine. Soro dibcvveş û şa dibû, dema ku evv guh
darî dikir. Bi rojan ji wî nediqetiya. Dbcvvast ku je hinek tiştan hîn bi
be. Ev hevala bi tehrekî din dibeje. Tu dibejî ku di dile meriyandeye.
Dijvvarî hînî meriyan dikir. Henek û qala rojen xweş û ronayî dikir.
Deh roja şûnde, qet di nava vvande tu tişt derbas nebûyî, hevale Soro,
be silav û be xeberdan ji cem derbas bû. Soro xemgîn bû. Bere got ku
dibe hevale wî evv ferq nekiribe, nedîtibe. Paşe fem kir ku xwe vvisa
dbcvvaze. Qet tu mene neda vî halî. Ve çare bi hineken dinre wisa bi
dost û heval bû. Paşe evvjî berdan. Demeke şûnde, çavva dest ji Soro
kişandibû, wisa jî dîsa hat, dest bi dostiye kir. Wisa nîşan dida ku eva
edet û xisete vvîbû. Rojeke başe, rojtira dine be sebeb û be tüne
dbceyide.
Soro fem nekir ku vve bi vî hevalîve çilo re biçûya. Be qerar bû

Soro.
Xortekî kinik û çavekî wî hinekî piçûk hebû di hundirde. Jîr, dijvvar û xurt bû. Xenji vve, vvekî şeytan hişyar û bi aqü bû. Zûtire her tişt fem dikir. Ji maleke devvlemend bû. Le dijî beg û axan bû. Ha ezraîl ha axa, ferqa vvan tunebû ji bo vî xortî. Çavva bûbû dijmine axan, bi xwe jî ni zanibû. «Piçûktiya xwede jî avvha bûm.» digot. Zûtire bû doste tendu rekiyan. Yekî mîna wî hesa hevaltiye, dostiye dayne tunebû. Comerd bû. Pariye deve xwe bi hevalen xwere parve dikir. Dosten xwe zû bi zû bîr nedikir. Doste doste xwe bû. Le zûtire poze xwe bilind dikir. Ti ştekî ji dile wî bigirta, dbcvvast ku bela xwe bi vvan bide. Diçû, bi xwe sere xwe digeriya vve çaxe. Cbcare bi cbcaran vedbcist. Çaven wî kes nedidît.
Dbcvvast şerekî dayne. Alîkî vviye dine hebû, alîkî xirab. Dema ku diqehirî, dile doste xwenî herî baş jî, dikaribû bişkene. Piştî çend saetan poşman dibû. Le bele careke dil hatibû şikestine. Evv piren di
272
nav kesan, hatibûn hildane. Carna hevalen herî baş dihişt, diçû li der doran, tişten vik û vala qise dikir. Yen ku evv nas nedikirin, diecibandin. Ya rastî evva serda pe jiyan bû. Levvra wisa bû. Dbcvvast, çîroken xort û keçan guhdarî bike. Dile wî hela he zelal nîn bû. Dema ku bîh na wî teng dibû, diçû girtîk didît, qala tişten vvüo dikirin ku bi saetan dikeniyan. Caran bîra derve dikir. Ji jiyana xwena derve, dû keçan gerandina
xvve qal dikir. Soro, Mîro û hevalen vvanî nû, Xalis û Bekir, doste vî xortî bûn. Soro evva baş fem dikir. Bi gelek aliyanve pir baş bû. Çend salan şûnde ev alen dine, alen xortiye vve biçûna, vve çaxe vve betir baş buya. Evv û Soro ku tene diman:
Ez ditirsim ku tu derve, tekevî bi zewq û kefe. Bi axanre hevaltiye

bikî. Bibî yekî mînanî vvan, digot Soro.
Evvî bi düpaqijî û bi dilekî nizm bersiv dida.
Ez jî car caran wisa dibejim, ji xwe re. Meriv tamîş nabin. Mal, milk û nizam tişten dine, alîkî meriyayî baş û bi namus hebe jî, tu din herî hedî hedî xirab kiriye. Daye vvindakirine. Meriv di davviyede re zîl dibe. Le Soro ez qewle meran didime te ku ez wisa nabim. Wekî vvisa bibûma, çi kare min li van deran hebû? Tu min rind zanî. Ez ku qehirîm, her tiştî didime bin lingen xwe. Pepez dikim. We awqasî ji deste axe kişandiye. Lo, ez bi dîn û îman, qet kesek, vvan mîna min nas nake. Dek û dolaben vvan, kes ji min rindtir nizane.
Birako te cima nexwend? Te ku bbcvvenda, tüye pir dijvvar bibûya, bi xwede. Ev abûqate vver tela tîne sere me, nikaribû ave li deste teke.
Evva him dikeniya, him jî ji van gotinan dizî dizî şa dibû. Min xwend. Bave min ez şandime bajer, mala nasekî me, bo ku di dibista na navînde bbcvvînim. Xvvede giravî ez di günde mede xwendevanekî yekemin bûm. Günde me nehiye bû. Sûk, bazar, qereqol le bû. Gele kî ji vir dûre. Ez çûme bajer, hefta peşîn, mamoste ez rakirim, ji min pirsî. Got ku nozda texe du çîqa. Nozda bi duda parveke. De bifikire Soro, min dibistana peşîn, penc sal xüas kiriye. Himjî ez yekemin bûm. Min nikaribû nozde sevan, bi du kesanre parvekim. Mamoste qehirî. Zaren bajer bi min keniyan. Min devji dibistane berda. Min bere jî ti ştek nizanibû, ye mayî jîji bîr kir, çû. Nika ferqa min û te tüne, di vî alîde. Ha elif ha mertek.
Ya rcbî, ya elem. Çilo hişe wî hemû şeytaniye hildida? Kî, çi dekan dike? Çavva texmîn dikir davviya gelek tiştan? Digot ku axayen di da vviyede vvenda bikin. Ji nihave li gelek ciyan sere vvan te kirine.

Hela tu bisekine. Bira ev partiyen nû, hinekî peşda herin. Te bi bînî. Çaven gundiyan, vve vebe, vve hişyar bibin. Mînanî mûriyane. Ça ven vvan ku vebûn, edî bi zehmet tene xapandine. Mezeke, ev pirseke ez ji tere dibejim. Ji bîr neke. Te bînî bîra xwe ku li girtîgahede hevalekî ji minre vvüo gotibû.
Ev xorta hevale tendurekiyan û bere peşîn ye Soro bû. Diçû cem Xalis, bûyeren çiye, firariye guhdarî dikir. Qala îbo vvüo hatibû kirine ku îbo li ber çaven vvî, merivekî pir giranbiha bû. Alîkarîkirina tendu rekiyan, Soro vvan tiştekî pir heja bû. Eva besî îbo bû. Di düe xwede gelek qîmet dida îbo.
Bijî. Merivekî bi namus bûye, biraye minbe. Kesen bi xîret, bi namus vvüo dibin, digot wî xortî.
Bîze tendurekiyan ji Remzî dihat. Çend kes ji çek, tiving firotine hatibûne girtine. Remzî jî yek ji vvan bû. Bere, li derve vvekî qiralekî bûye. Lexe, bibire. Kef û zewq. Di nav hevalen xwede, ye herî bi aqü te xuyane. Çekan difroşe, peran parve dike. Levvra li ser hevalen xwe quretiye û hikim dike. Xwe cesur û dijvvar nîşanî hevalen xwe daye. Ji jorve li hemû kesan dinihere. Dinede, heye tüne, xenji wî kes tüne. Di girtîgehede bi her kesîre hevaltî nedikir. Emir dida hevalen xwe. Mezine vvan bû. Teşaxuza wî nedihate kişandine. Rojen peşîn kesî ev ke masiyen wî nedîtin, le qasek ku derbas bû, giştan ferq kirin. Tirsonek bû, le bi qerîn û zart, zûrtan tirsa xwe vedişart. Tamîş nedibû. Her di çû divveşiya. Mene hevalen xwere digeriya. Evv dişandine ser girtiyen dine. Paşe vvekî meriven mezin dikete nave. Ji hevalen xwe û yen dinre hersa xwe dihanî. Dbcvvast nişan bide ku «li ve dere gerek pirsa min derbas bibe». Dbcvvast ku hevalen pere, xizmeta wî bikin. Yekî pîs bû, nedihate kişandine. Dema ku Soro vvan evv nas kirin, edî ne wisa bû. Evv roj derbas bûbûn. Xwe li ser ciye xwe direj dikir. Hinek ciyen min

dieşin digot û li baxçe çend serî ger jî nedikir edî. Bencvveketin û bîhntengbûne
mala wî xirab kiribû. Evv çekfýroşe bere, bi çiya û ezmananre
difiriyayî çûye, devvsa vvî, yekî tolaz, bexîret hatiye. Bi xwere nabîne
ku dest, ruye xwe bişo. Ji bereve çaven tendurekiyan evv nedigirt.
Bi meriven xweve hatibû ser xweşiye û paşe Soro vvan jî bersiv dabû
ne, çûbûne ser ciye vvî. Seroken eşîretan, axaye gundan çer dikir, wî jî
vvüo mevanen xwe qebûl dikir. Paşe tendurekiyan tedigîhiştin ku pe
re dostî ne hesaye, levvra tene silav didane hev.
274
-XXXVIIQet
şaşî nebû. Her hefte ji Tendureke hatin, ji bo dîtina girtiyan.
Kare gund nediqediya. Yen giran çûbûne serî. Xerman rakiribûn edî.
Ka û gîha kişandibûn. Der doren xaniyan, ciyen hurşiyayî çekiribûn.
Savvcî gazî şofer û xulamen Ûsiv axa kiribûn. Jina wî jî pere. Navbera
du heftande jinika feqîr, dîsa ji serîde, yen bûyîn qal dikir. Çilo
li Maruf xistin, hate ber çaven vve.
Evv Soro, evve çûrî sor nebûya û min xwe nehaveta ser küre xwe,
vve Maruf bikuştana. Hemû gundiyan ledbdstin.
Savvcî bi tevayî guhdarî dikir, je pirsî.
Soro nedihîşt ku lexin? Ne?
Bele evvî nedihîşt. Lenexin, lenexin, digot.
Paşe mere vve hate bîre. We gelekî biqehiriya. Cima wisa got? Qet
tiştek şûnve nedihîşt, vve bûyinen nemayî bihaniya sere feqîre. Le edî,
vvisa gotibû careke. E, ya rastî jî ne vvisane cima?
Ev çiye gelo? Oumandare cendirma, ji bo Soro baş xeber nedabû.
Ûsiv axa digot ku her tiştî Soro dide kirine û evv bi xwe dike.
Mere te jî dît ku Soro küre te dipareze? Ûsiv axa çiqasîji vve dûr

bû?
Nizanim. Ez, mere xweve li ba hev bûn. Dibe ku wî jî dîtibe.
Bi texmîn çiqasî, li piş vve bû? Dema ku te û Soro Maruf diparast?
Hevvekî ji me vvede bû.
Mere te û Soro bi hevre xeber didan? Tu tiştek di nav vvande
derbas bû? Bere?
Na xer, tiştek derbas nebû. Xeber didan, le mere min ji wî heznedikir.
Nizanim. Ez tevî karen vvan nabim. Ez jinim. Tu tiştî jîji min
re nabejin.
Savvcî tegihişt ku jinik rast û ji dil xeber dide. Oumandar û Ûsiv axa
di derheqe vî mcrivîde cima wisa peyivîn? Hişe wî hünedida. Paşe So
ro hate peş çaven vvî. Dema ku ji bo bûyere pere xeber da, gotinen vvî
hatine bîre. "Hûn hemû memur, bi axanre didin distînin. Bi vvanre dostin.
Em feqîreýý belengaz çi bikin? gotibû." Wisa dihate bîra savvcî.
Di gotinen Marûfde jî tiştek tunebûn. Bi vî halî, savvcî nikaribû ji
nav kar derkeve. Xeberdanen kesî jî alî wî nedikirin. Kî gunehkare,
sûce keye? nedihate xuyane.
275
-XXXVIIIRojeke
gazî tendûrekiyen girtî kirin. Li oda nivîsdar bûn. Hine kaxiz
dane hemûyan. Çar rûpel bi hevre giredayî bûn. Nivîsdare qelew
got ku:
Ev «îddîanama» vvene. Çaven vve ronayîbe. Mehkema vve deh
rojan şûnve dest pe dike.
Xwendin û nivîsandina vvan nîn bû. Bi kaxizen xweve zivirîne qovvîşan.
Çend kesen ku ji van tiştan fem dikirin hedî hedîji vvanre xwendin.
Paşe:
Qet tu tişt jîji ve mehkeme dernakeve. Kerî vveye. Binherin, çi

dbcvvazin ji bo vve. Madda çarsed û pencîşeşa. Evmadda ji bo kesen ku bi dil û hiş, kesekî birîndar dikin. Le bi tevayî bûye. Ye ku birîndar ki riye ne kifşe. Ne vvisane? Aha. Cezaye ve keme. Ne tu tişte. Ji bo vî cezayî jî rapora evv kese birîndar gerek be zanîne, got yekî.
Paşe çû ji bin balîfe xwe, kitebeke qanûna cezaye hanî. Hinek rûpelen vve rizyayî û diryayî bûn. Qasî abûqat, vvekîlen devva ji van tiştan fem dikir. Girtiyan ku bûyeren xwe jere digotin, evvî çiqas ceza bibiriya, li mehkeme jî vvüo derdiket. Rûpelen kitebe vvelgerand û vvelgerand. Heke ku alîkî bedena ye birîndar, be xer û be kar bibe, tiştek je neye, ceza zede dibe. Wisa dinivîse qanûn. Û dîsa, heke ku birîn di rû û dora seriye meriyabe, cîkî ku be dîtinebe, di dîtina, bihîstina meriyade kemasî hibe, cezaye vve du, se carî zedeye. Ya rastî eva jî li ser dîtina hakime. Maye ser însaf û dîtina vvî. Hûn qelebalixin, levvra dîsa jî wisa zede nabe cezaye vve. De herin, tivdareken xwe bikin. Hûn jî revvîne, çendekî şûnde. Hemû girtîgeh şabû.
Li alî jinan, yek jî dabûne Fate. We kaxîz bi küre xweve şânde ba Soro. Gelo ev kaxiz cine? Zanibû ku Seyîtxan serederiye nake, levvra Cevvahira gardiyan alî vvan kir. Niha li aliye jinan jîşabûn û hevîkirina berdane heye. Seyîtxan tiştek fem nedikir, le wî zanibû ku guhartineke baş heye îro. Ku qala berdane, çûyine bû, ji hemûyan pirtir evv şa dibû. Bi evîna dile xwe car diçû der û car dihate hundir. Bîra gund û biraye xwe kiribû. Bîhna wî teng dibû edî. Biraye wî car cara hatibû dîtina vvan. We çaxe rojen vvan gelek bi kef û xweş derbas bûbûn. Ne dbcvvast ku biraye vvî, şûnve here gund. Roja dîtine bira qet xüas nebe. Careke jîji diya xwere qal kiribû.
276
Küre min. Lavve min. Xwede ji vvan razîbe. Sergardiyan bi zoreke te li vir digre. Mezinen wî jî hene. Nanelin. Levvra qet nabe. înşa-

Ua eme herin ba biraye te. Gelek nema. Tu ji wî pir hez dikî, ere?
Le, le daye. Wisa je hez dikim ku. Yeke jî evv li vve dere natirse gelo? Teneye. Çi dbcvve?
Bi xal,tiya Zelexare dimîne. Evv rind le miqat dibe, digot û bi po re Seyîtxan dileyst.
Rojtira dine Soro û hevalen wî çûne ba Xalit efendî. Di girtîgehe de re nîşan dida û alîkariya devvan dike. Derde xwejere gotin. Di mehkemede,
vve çavva bikirana, je pirsîn.
Xalit efendî, bav, birayo. Kesen nezan vvekî meriven korin. Tu dikarî, xera de û bave xwe, ji mere bejî, me hîn bikî ku vve çavvabe? Eme çer bikin? Abûqate me heye, le te dît ku nehat. Tiştek nema ji roja mehkemere. Rojek çû ma neh. îro jî nehesibîne, ma heyşt. Hefta hatî, piştî îro.
Xalit efendî zede düges bû. Bi terbiye û töre hatibûne cem, qedr û qîmete wî zanibûn. Xwe kom kir. Rez da pesîra kirase xwe. Denge xwe niherî.
Bere vve vve bibin, nave vve û ye de, bave vve ji vve bipirsin. Kar û jin, zare vve. Paşe vve vvan kaxizen ku ji vvere şandine, bbcvvînin. Pey vve
re vve ji vve, gotinen vve bipirsin. Heke ku evvanan di rojekede biqedin, başe. Na, hûn vve roje, dereng hildabin û dereng dest pe kiribin, texmîn nakim ku biqede. Nîvcî dimîne. Xwede bike ku zû dest pe bikin
û pirsiyara vve hemûyan xüas bibe. Xeberdanen vve, başin. Bi hevdu digrin. Tu tirsa min, di ve devvede tüne. Kesî tu sûc nehavetiye ser ke sî. Ev tiştekî başe. Le bele em nizanin niha, şahid vve çi bejin? Wan be re çi gotiye?
Mîro xwast ku alî bike.

Jina Ûsiv axa, şofer û xulamen wî guhdarî kirine. Le em jî niza nin ku çi gotine. Şofer merivekî baş te xuyane. Ji me qehiriye. Dibe ku dijî mebe. Guh nede xulaman. Hemû jî seybisanin.
Şofer dij beje jî vve çi bibe? We beje ku dihatin li minxin. Ve ze detir? Evv jî vve bi xwe gotiye. Ne vvisane?
Bele vvisane, got Soro.
Le şîreta min li vvebe ku kem xeber bidin. Wisa dûr, direj qal ne kin. Kin û kurt bersiva vvan bidin. «Bele. Na.» Bersiven avvha başin. Zanî cima, ev hakim, kare xwe baş zanin. Hostane. Şýucul û kare vvan eve. Bira ji deve meriya tiştekî negrin. Tu edî bi vvan nikarî. Meriyan şaş dikin. Meriya di nav xuyede dihelin.
277
Xortek ji tendurekiyan, ji giştanre çay çekir û hanî. Vexwarin, qala tişten dine kirin. Xalit efendî dîsa ji vvanre got: Hûne bibinin. Gotineke ez ji vvere dibejim. Ve çare nebe, vve careke din vve berdin. Çar meh nîv bû, nezîkî penc mehan. Cezaye vî karî kifşe. We çi bibe? We vve berdin. Mehkeme vve wisa here, çendektdin jî.
Destur je xwastin û rabûn. Soro çû cem, penc paqnot kire berîka vvî.
Na bave min. Çi zehmet dibînî? Got, le ruye wî vvüo nedigot. Evv jî duşa bû.
Tendûrekî, evv heft rojan gelek be sebir bûn. Sibeh û evaran, rojen mehkeme dijmartin. Gelo haya abûqat jî bûye, an na? Çûn ji Xalit efendî pirsîn. Gerek mehkeme xeber bida wî jî. Ev xeber ku bihîstin, heviya vvan her zede bû.
Abûqate vvan ku rabûya, xeberdaneke xweş bikira, hakimen bibe, nebe vve nerm bibûna. Cima xeberdana vvan û ya abûqatan tu yek bûn. Ax vvekî bihatana berdane. Hefteke, hema usa evîn û dibcvvestî, qala

derve dikirin. Heta îro, tu cara awqas nexwastibûn bene berdane. Hi nekan bîra mal, jin û zaren xwe, hinekan jî bîra düketiyen xwe dikir. Fate pirs dida hevalen xwene girtîgehe ku piştî berdane be dîtina vvan. We evv ji bîr nekirana. We bi deste xwe, xaltiya Cevvahirere göre çekrrana. Rûne nivîşk û be xwey jere bişanda. Çavva dihatine ji bîrkirine? Çiqas alîkariya vve kiribû?

Xeber şandine gund, ji bo roja mehkeme. Evv gardiyane mezin û terikî çûbû xane û ji gundiyen vvanre gotibû.

Bekir û Xalis, vve hefte qet terka Soro nekirin. Wisa nişan dida ku dibe vvan berdin. Bele, herduyan jî çend caran dîtibûn ku yen vvisa, na va çend mehande tene berdane. Cezaye Xalis û Bekir jî zede nemabû. Hatibû ser mehan. Herd jî, penc, şeş mehan li pey hev, vve li der ve buna. Qewl û pirs didan ku vve hertim, li hevdu bipirsiyan. Ev hevaltiya xweş, gerek li vir neqediya. Kare dinyaye kifş nabe. Dibe ku dest bidana hev, derd û kulen hev bipeçandana. Tu dinede tişten nebûyî heye. Bekir ji Sorore:

E. Birao, hûn ku derkevin. Hûne bi Ûsiv axare çilo bikin? We, careke zevîxüas bikira. Hişe vvede, tu re û dîtinek heye? Xwede neki rî, tiştek neye sere te?

Em çi bikin bira? Çi zanim. Bi tevayî, axe nezî erde nekin. Ve vvede çi ji deste me te? Dibe ku ve çare, çave wî tirsiyabe hinekî. Di be ku be re. Wer te xuyane ku ve çare ya herro, ya merro, got Soro. Xalis:

278

Ez jî wisa texmîn dikim, vver dibinim.

Bekir kete nav pirsa vvî.

Bi hevalen xwere, li vir baş xeber bide. Hûne çi bikin, vve çilo bi be? Hûne li gund dîsa bipeyivin. Dibe ku hinek, kesî guhdarî nekin.

Gerek hûn ji nihave bizanibin ku hûne li gund di reyeke çüode herin. Van rojen girtî gerek kareke bigîhînine vve, ne vvisane? Ji vir hevde ke sen bi qerar û dizanibin ku vve çi bikin, derkevin. Evvjî, bira bi gundi yanre bipeyivin. Ji her serîkî gerek dengek dernekeve.
Soro li hundire çaven Bekir niherî û:
Ez jî difikiriyam Bekir. Mîro jî. Ji minre got. Sibeh nîvro şûnde, berve evare, eme di nav xwede qise bikin. Bira kes ferq neke. Çi za nim bavo, çi dibe û çi nabe? Dibejin ku guhen erde hene. Paşe bira derdekî dine neye peşiya me. Bira Ûsiv axa, dijî me tivdareken xwe hünede.
Rojtira dine, navroj xwarin. Soro:
Zarno, hela ranebin. Em hinekî bipeyivin.
Mîro çend kîlo tirî dabû kirîne. Tirî dbcvvarin. Soro:
Dibe ku em ve çare jî bene berdane. Em li gund di reke çavvada bimeşin? Hûn çi dibejin? Me heta niha, cîrantî û hevaltîke baş kir. Ye kîtî û dostîya me jî vvisa. Gerek ku em bi hevdu bişevvirin. Cîkî ji vir baştir jî tüne. Ji bo xeberdane, ji gund rindtire. Kî, çi dibeje?
Oaseke hemû bedeng bûn. Kesî xeber nedida. Kesî ev pirsa hevî nedikir. Le her roj di nav xwede, ev tiştan bi saetan dipeyivîn. Kesî dest bi peyive nekir. Tirî dbcvvarin û li heviya hev bûn. Soro bi nîv şaşbûn û ken:
Çi bû? We zimane xwe vvinda kiriye? Her roj vve guhen hevdu dibir. Hûn cima wisa kerr û lalin. Dibe ku tiştekî gotine tüne?
Oasim kerrbûn bela kir.
Ez tiştekî dûr û direj nabejim. Nikarimjî. Bi ya minbe, be feydeye. We zanim ku... Em bi mehkeme, hukumat û arzuhal... Bi van riyan, axe nikarin. Xvvede jî zane, em jî zanin. Heqe meye ev erdan. Gund ye me gundiyane. Le eme ve ji kere bejin? Gundî ku yekbin, me dît.

Kes nikare tiştekî beje. Oulan diðerin ku seren xwe texine. We hale Maruf dît. Ji bo me, ya bi tevayî terkkirina gund anjî dîsa bi tevayî li dijî axe sekinandine peştir re nemaye. An eme vî karî bibine serî, an jî eme her tiştî vvinda bikin. Levvra dîsa bi tevayî guh bidine hev, pişta xwe bidine hev. Bave me jîji tirbe rabe, em erde xwe nadine kesî.
Seît li cem wî rûniştibû. Pirsa wî birî:
Bele, bele. Em çilo bikin? Çer dibejî tu?
279
Ez dibejim ku Ûsiv axa berî me dide. Ne heqe vviye. Cima vvüo dike? Bi quwete, lema. Le bele em, ji wî û meriyen wî zedetirin. Emjî bi quwetin. Hetanî evv berî me dide, em berî wî bidin.
Li ser van peyiven kin û vekirî, gişt kerr û lal bûn. Dibe ku hemû avvha difikirîn. Le kesî, vvüo vekirî û rût tezî nedigot. Wisa li peş ça ven meriya û ronahiyede bû ku le niherandin bes bû. Le dîsa jî ricaf dikete dile meriya. Li peş awqas zordestî û teda, dîsa jî, berdana axe, ji vvanre tiştekî xerîb dihat. Hişe vvan hünedida. Li girtîgehede hedî hedî tişten avvha dihatine bîra vvan. Le niha, li ser xeberdana Oasim te digot ku bi qamçiyan li ruyen vvan xistine. Qasim dît ku hemû be deng guhdarî dikin:
Çi bû? Dema ku Ûsiv axa berî vve dida, evv, vvüo awqasî nedifikiriya. Ji bo ku evv berî vve nede, gerek hûn berî wî bidin. Em cima bi kefa xwe hatine vir? An em li bela xwe diðerin? Na. Na. Evv dest ji me nakişîne. Em dbcvvazin dîsa jî, mîna hesîr û xülaman bbcebitin li vvan zeviyan. Para wî jî bidine. De vvere ku evv qebûl neke. Bi pîhna li qûna me dbce. Waxta ku vvisane... An vve di ciye xwede rihet rûne, bela xwe bi me nede. Eme vvekî bere re herin. An jî mirine bidine peş ça ven xwe, berî wî bidin. Ji gund dendn.
Paşe kesî xeber neda, demeke. Mîro vvüo dest pe kir:

Gotinen Qasim rastin. Em niha li ser dere kaş û kendalanin.
Wexta me ya hevîkirine û sekinandine ne pire. Ya eme di kaş û kendalande
bifirin, anjî çi ji deste me te, eme bikin. Çiqas ji me be, em xirabiye naxwazin. Wisa nîşan dide ku qedera me avvhaye. Ji mere rehetî tüne. Rehetiya vve, di bine erdebe. Bira yen pey me ten, ve reziliye nekişînin. Kûçelaniye ya rastî. Levvra ve çare gerek em her tiştî bi nine peş çaven xwe. Girtin û hepis bû, me evvjî dît. Li qereqolan ku tan bû, kesî ji me betir nedît. Ji ve vvede çi heye? Mirin, ne vvisane? Çavva hebe, eme rojeke nemirin? Bira hevvekî jî Ûsiv axa tekeve haya cane xweyî serîn. Em naxwazin lexin, wî bikujin. Kuştin tiştekî xirabe. Eme tene li zeviyen xwe bibine xweyî. Bira deste xwe ji vvan bikişîne Ûsiv axa. Axa nabeje jin û namûsin, giştan dişine hepse. Heke ku bi camerî li ciye xwede rûdine, ser seran. Na, vve vvede, evv çi li me dike, eme jî li vvî.
Seît:
Dibe ku piştî birîndarbûna küre xwe, hatibe re. Bûye meriv. Di be ku tirsiyabe. Heke ku çaven wî bi dijminatiye nehatibûne girtine,' vve here di ciye xwede rûne. Ûsiv axaye... Tu çep û raste wî te zanîne? Li ber dijminatiya me, neçû bi Zubeyd axare lev nehat cima? Zubeyd
28,0
axaye ku bave wî da dardekirine. Niha di nav vvanre av derbas nabe. Meriv tu cara kesen vveha bavver nake. Dibe ku bitirse û be re. Ûsiv axaye duh here, yekî din be. Dibe ku her here har bibe. Ji bo evlegek zevî, dine li tevî hev bike. Wekî nû.
Yekî xort:
We dît. Jin û mer, çilo vvekî mûriyan ravviştane ser Maruf? Diya min jina min kiribe, heke Ûsiv axa nebe meriv, eme hiriya wî quloz bi

kin.
Li ser ve pirse, hemû keniyan. Tirî qediyabûn, qirşik tene mabûn di sÝniyede. Dîsa Mîro:
Berî girtine, ji bo yekîtiya cîranan em hemû xebitîn. Çi ji deste me hat, me kir. Hinekan xwe dane der. Le sikir ji xwedere ku tevayiya me başe niha. Le gerek feyde ve girtine bigiheje me. Em kare je bi kin. Dersekeje hildin. Em hatin, me li vir kesen nû dîtin, nas kirin. He mû ji bo sûcen dine. Kesen cure cure... Yen ku mîna me, ji bo sere er de hatine... Me her tişt dît. Hetanî mirov kar bike, çend cara vvinda di ke? Evv peren ku me dane abûqat, ji mere bû derseke giranbiha. Em vvekî koran, bi nezanî, çûn, ketine bîreke. Her tişt jîvvüoye. Gerek em li ser kare xwe bisekinin. Çi dibe, çi nabe? Gerek em bipirsin. Wisa nebe, şaşika meriya, bi paşopelî didine sere meriya. Heke ku em nemirin, ji vir derkevin... Abûqat mînanî heta niha kir, kare me meze ne^ kin. Eze herim di navxelqede pesîra vvîbigrim, çend pirsan bejim. Min sond xwariye. Him jî eze xwe bejim ku bira nebe sûce kesî. Li ve dere bavveriya me bi hevdu her zede bû, em tiştnen nû hîn bûn. Ji bejna xwe zede xebernedane. Pir zede peşde neçûyine. Oedre yekîtiye. Em ku derketin, îro nebe sibe... Wekî, qet tiştek nebûyî, gerek em herine ser karen xwe. Ji bere şiyartir, ji bere zedetir pişta xwe bisperine hevdu. Yekî dît ku qise direj dibin, çû çay çekir, hanî. Bere kesî xeber ne dida. Niha zimane giştan vebûbû. Gişta xeber dida. Hinekan digot ku dema çûne gund, çend kesa bişînine ba Ûsiv axa. Em her tiştî ji bîr bi kin, bi hevre baş re herin.
Evv çiye? Em ku vvüo bikin, edî em nikarin peşiya wî bigrin. We vvisa bizanibe ku em ji wî ditirsin, lava dikin. We vvekî dîkan, xwe gîze veke. Piştî awqas zorbetiya Ûsiv axa, awqas girtîbûne, îca eme herin xwe bavejine axe? We dîsa be re, tu dibejî? We deve Marûfî xwar bi

hele û be, bi vvere cîraniyeke xweş bike? Ev gişt behişîne. Ji aqüe xwe derxin. We her jorve binhere. Ke çû ber dere ke, gerek pir tiştan bide bin lingen xwc. Neyne ber çaven xwe. Çî me maye ku em ji ber çavan dûr bixin? Em ji bo nemirine dijîn, digot çend kesan û dij derdiketin.
281
Soro ku cîranen xwe guhdarî dikir, dilfýreh û dibcvveş dibû. Bi xwe xwe ferq dikir ku ne Soroye bereye. Ji bere betir tiştan dibine û difikire. Cîranen xwe jî bi vî tehrî dît, levvra pere şa dibû. Dbcvvast ku bi ra hema usa qise bikin. Gişt jîbi evîn û bi hevî bûn. Rojen ronayî difikiriyan. Bi hevrebûn dbcvvastin. Hemûyan zanibû ku ev bara ne ye ye kî teneye. Evv, bi cîranen xweve edî ji bere peşde bûn. Mîna bere şaş û metel nediman, Kesen vvisa, ne gelekî bi aqü û peşde bûn, le ji bere baştir bûn.
Tengasî û van perîşaniye, evvana her baqü kiribûn. Tegihîştibûn. Hînî fýkirandine dibûn. Geleken vvan peyivîbûn. Hema hema vvekî hev difikiriyan. Soro xwast ku van gotinan texe bi rezeke.
Feyde tüne ku em qala yen ku hatine seren me bikin. Me gelek kişand, eme hejî bikişînin. Peren me nîne. Ye hebû jî me da abûqat Fihat bege. Bi saya sere Mihe. Evvî ji mere çi kir? Hûn gişt zanin. Ni ha ne zevî heye ne jî cot. Di deste mede tiştek tüne. Zeviyen nû, îsal tiştek nedan. Di hukumatede jî kesekî me tüne. Yen ku deste me bi gre, nîne. Me dibistan ûxwendin nedît. Hetanî îro jî nezan man. Zar û zeç li ber dîvvaran û deriyan. Bi vî tehrî, seren xwe xwayî dikin. Xwede zane nîv ter û nîv birçîne. Ziken vvan ter nabe. Em hela he nezanin, Tiştekî nizanin. Le ne vvekî berene. Gerek ku zû neyene xapandine. Dema ku dîsa xapiyan, ferqa me û keran tüne. Ne vvisane cima? Ker bi kertiya xwe, cîkî ku dikevine heriye, careke din ji vvir derbas nabin. Tu cara lingen xwe navejin. Çilo ku heval dibejin, em yekîtiye hîn bûn.

Ev ne tiştekî wisa hesaye. Kare herî zehmet yekbûne. Yek ku di tingije, xirab dike. Ye din peçîke dave, xirab dike. An jî meriven axe, ten û xirab dikin. Bi dizî dizî, ale dinre kar dikin. Cima hûn nizanin? Li ba me jî wisa nebû? Eme li ser karen xwe bin. Ku le nebine xwayî, tiştek bi deste me nakeve. Fate rast digot, le geleken me fem nedikir. Me di got ku jine, kesî guh nedidaye. Ya rastî evv bû ku vve ji me baştir didît û digot. Çi bû, bû. Ya rind eme be şer û be qelebalix herine ser zevi yen xwe. Eme erde xwe hildin û daynin. Bira mehkeme jî di alîkîde ba jo. Em qet dendikek genim jî nadine axe. Paşe eme li benda mahkemebin. Qet kesîjînedîtiye ku mehkemen vvilo neh, deh salande biqedin. Wexta ku axa hat, erde me ajot, anjî nehişt em erde xwe biçînin, vve çaxe eme wî ji gund dendn, berdine vvî. Reke dine nabînim ez. Em ku çûne gund, bi merivtî, bedeng û be teşqele eme dest bi karen xwe bikin. Bela xwe di kesî nedin. Kînge ku Ûsiv axa dest ji me nekişand, eme bi tevayî berî wî din û zeviyen xwe je bistînin. Ku nebû, em nehatine berdane, bira cane me saxbe. Em awqasî di hundirde mane, cima

282

em nikarin qaseke din jî bimînin? Ji bo feqîren mîna mere, her der ye ke. Ferq nake. Yen ku di rehetiyedene, kevçiyen vvan di hingivdene, bira evv ber xwe bikevin. Ya rastî me li ve dere kef kir.

Hemû keniyan. Soro peyiva xwe nebirî.

Hûn naniherin? Çend mehin, li ser piste û be kar, veleziyane em. Hestiyen me hemûyan çer qalind bûne. Qet yek ji me nexweş neket. We çilo bibiya?

Roja mehkeme hat gihîşt. Hemû vve şeve di meraq û tirşede bûn. Rûyen xwe kur kirin. Ji girtiyen din hîn bûbûn. We şeve av germ kirin, xwe dişûştin û avdest digirtin, ku xwede alîkariya vvan bike.

Kine û pergela xwe diniherîn. Gören nû dbdstine piyen xwe. Yen bi

sol bûn, boyax te didan û yen bi çarbe bûn, bende vvan teselî dikirin. Kirasen paqiş li xwe dikirin. Yen ku kirasen vvan tunebûn, girtiyen di ne alîkarî dikirin, yen xwe didane. Tendûrekî hevde kesin. Ji vvanre kiras, çaket tivdarek kirin zehmet bû. Dîsajî di navxwede, re birin. He mû, sibeh zû rabûn. Avdest girtin. Di neynikande xwe meze dikirin. Di qowişede diçûn û dihatin. Nikaribûn di cîkîde bisekinin. Kesî ji vvanre tiştek negot ku, cima awqas zûtire hevalen girtî hişyar dikin. Di rojen vvehade hevdu dibaxişandin. Di alîkîde jî, tendûrekî him hevde kes bûn, him jî mehkema peşîn bû û nû dest pe dikir.

Saeta çûyine hat. Desten du kesan bi hevre kelepçe dikirin. Ye da vviye, herd desten wî bi hevre. Li dora vvan cendirme hebûn. Ji dere mezin derketin. Cara peşîn bû ku kelepçe li desten vvan dbdstin. Van hesinen sar, ricaf dida hundire meriya.

Li der qaseke sekinin. Fate jî hanîne cem vvan. Be kelepçe bû Fa te. Li pey vve cendirmekî bi sungî. Bi meraq li hevvîr dora xwe dinihe rî. Hate ba gundiyen xwe. Desten vvanen bi kelepçe meze kir. Çar penc meh bû ku gundiyen xwe nedîtibûn. Çiqas kincen xweşik le bûn? Ser rûyen vvanen kurkirî û bedevv bûn... Silav da vvan. Hinekan Seyîtxan je pirsîn.

Li pey min, gelekî giriya. Dît ku ez bi cendirme bi sungîve diçim, tifalî xwe peritand.

Renge Fate jî dibiriqiya. He bedevv dihate xuyane. Van mehen gir tî, li hemûya hatibû. Xwe vvüo xemilandibû. Kincen vve yen kevn, le bele paqiş bûn. Di nav cendirmande bi vî tehrî çûyin... Fate bere sor û paşe sipîçilokî bû. Te digot ku revaçûyin ji bîr kiriye. Paşe hedî he dî hate hale xweye bere. Peyre ketine riya mezin, riya sûke. Li sûke ge lek kesan, li ber dikanan, li kuçan li vvan meze dikirin. Cendirme, ke lepçe, awqas girtî û yek ji vvan jî jin bû. Hemû kesî meraq dikir. Sûke

giştî li vvan dinherî. Seyra vvande bûn. Bi dest û tiliyan evv nîşanî hev dikirin û xeber didan. Evvana riya sûke, ji serîkî heta sere dine derbas bûn. Wekî paşa û qumandare vvan di peş eskeranre derbas dibe. Mî nanî eyden rome. Çûne qonaxa hukumate. Mehkeme di qate herî jerînde bû. Yen ku karen vvan li mehkeman û li qaten dine hebûn û xenji vvan, qelebalixeke giran kom bû. Oorîdor tijîbû, nişkeve. Li vvan, ya pir li Fate meze dikirin.
Hinekan:
Ev kîne, çi kirine? digotin. Ji yen dora xwe dipirsiyan.
Hinekan bi nezanî ser milen xwe bilind dikir. Yen ku tiştek zani bûn, bi kurtayî qala vvan dikirin.
Di ber derî mübaşir hate xuyane. Yekî kal û por vveşyayiye. Kincen kevn û mibaşiriye lebûn. Westiyayî û te digot ku olamiye dike. Bi dengekî bilind:
Tahir Yilmaz... Osman Qaya.
Panzde hevalen vvane dine...
Sekinî, li kaxiza deste xwe niherî.
Fatma Keskin.
Cendirman tendûrekî hildane hundir. Saloneke mezin. We biçûna ku? Ev oda mezin, tirs û xof dida dile vvan. Te digot ku serma dikin. Gaven xwe bi tirs û piçûk dihavetin. Çaven vvan çilmisî û mînanî kevvan li dora xwe dinherîn.
Mibaşire gava dine, ciye vvan, di nav rezen darînde nişan da. Li ne zîkî derî, Fate tene di rezekede bû. Pir kesen bi meraq li dû vvan tijî salone bûn. Le li ale girtiyayî çepe, cîkî gelek mezin tunebû. Kem ke san li ser piyan guhdarî û meze dikir li wî yalî. Salone gelek kes hünedida. Hineken ku nikaribûn tekevine hundir, li ber derîbûn. Seren xwe

direj dikirin, li van gundiyan diniherîn. Evjinika di nav vvande çi diðe re, gelo? Çaven gelekan dihat li ser Fate disekinî. Fate di van niherandinede
be kef bû. Xemgîn û şermoke bû. Sere vve di berde, bi tiliyen xwe dileyst. Hakim li peş vvan, li cîkî bilind rûniştiye. Tiştekî fireh li xwe kiriye, pesîren wî sorin û dibiriqin. Ji wî vvede savvcî rûniştiye, li ser wî jî tiştekî wisa heye. Li pist vvan bi herfen mezin hatiye nivisan dine: «Edalet rükne milke.» Li bin ciye ku hakim û savvcî rûniştiye, nivîsdare
mehkeme, li peş, makîneke nivîsandineye mezin heye.Pore ha kim kin hatine birine û dora vvan edî dest bi gevvrbûne kiriye. Rûye vvî gilover, çaven heşîn lene; Dosye û kaxizen peş xwe tevdida. Li peş savv cî du kiteben qalind û yen nû hatî meze dikir.
284
Hakim tiştin bi nivîsdar da nivisandine. Girtiyan fem nedikir, çi di bûn. Paşe li vvan vegeriya:
Li günde vve, cîrane vve Maruf heye. We evva birîndar kiriye. We xwastiye ku wî bikujin. Raporen wî hene, ji nexweşxane. Se mehaji ka re xwe bûye. Alîkî deve wî kişyaye. Levvra ji bo vve, ceza te xwastine. Le berî van gotinan, hakim, yek û yek kî kiye da nivisandine. Jin, zar, de û bav, günden vvan. Kesî tiştek fem nedikir. Rûyen hakim di niherîn. Hakim ji nav kaxizan telgrafek dendst û xwand. Da nivisan dine. Ji abûqate vvan, Fihat bege dihat. Li cîkî dine mehkema wî hebûye, levvra nikare be. Mehkema dudade, vve li vir buya.
Hakim, ye herî serîde rûniştî, Tahir rakire ser piyan. Ji lexistine, dirane vvî hatibûne şikestine.
Küre min, te bihîst ku min çi got? Tu çi dibejî? Çüo bû, ji minre beje. Te eva suca kir an nekir?

Tahir li dora xwe niherî. Alîkarî digeriya. Kire bilde bild.
Na xer bege min. Kesî nexwast ku Maruf bikuje, lexe. Min jî lenexist. Wan zeviyen mejî desten me girtibûn. Dbcvvastin ku devvsa di bistane, evv ciye başî li peş gund jî bajon. Bi traktöre dest pe kirin. Gundî bi tevayî, dil kirin ku nehelin û vvan ji zeviye dendn. Bi kevir û daran çûne ser. Ez jî hebûm. Kevir dihavetin. Paşe evv birîndar bû. Hakim gotinen wî bi rez û rind, bi nivîsdar da nivisandine. Paşe:
Dare ke, kevire ke leket, tu dibejî? Te nedît?
Na xer min nedît. Herkesi tiştek dihavet. Gundek hemû. Ez ni zanim, bege min.
Paşe je pirsî, cendirme kînge hatin? Birîndar çer şandibûne bajer? Peyre evv da rûniştandine û gotinen Tahir yen bere, careke din jî xwend. Bere jî vvekî niha xeber dabû. Hakim ve çare:
Hûn cima neçûn, vve evv şîkat nekir? We çû lexist. Ke ji vvere got ku lexin?
Na xer bege min. Qet kesîjî negot. Hemû bi xwe serîxwe hati ne vvir. Me ji bo erde xwe Ûsiv axa dabû mehkeme. Le tiştek je der neket.
Li ve derede xwe şaş kir. We çi bigota? Be tivdarek bû.
Li piştî zeviyen gundiyan, ciye dibistane ku ajot, gundî tamîş nebûn. Osman li cem Tahir rûniştibû. Dît ku çilo tene mehkeme kirine, tir sa wî şikest ûkembû. Evvşaşbûnali ser, çû. Hakim, jivvîjî evv tişt pir sin. Bersiv vvekî hev bûn. Paşe gotinen bere dbcvvand û derbas dibû.
285
Yen ku bi meraq guhdarî dikirin hedî hedî kem bûn. Mehkeme zû dimeşiya. Hakim jî dibcvveş bû. Gelekî nedivvestiya.
Dor hate Fate. Yen guhdarî dikirin, her ker bûn, li ale vve dinihe rîn. Nîvro bû. Dev, zimane Fate zûha bûbû. Li günde vvan bi meranre

qise kiribû. Fikren xwe gotibû. Le, vve di nav van bajariyande çilo xeber bide? Çîpen vve diricifiyan. Hişe vve diçû. Le bû ku bikeve. Bi zeh met li ser piyan disekinî.
Tu çi dibejî keça min? Binihere, ji bo te, çi dibejin, çi ceza dbc vvazin. Te jî çûye, lexistiye. Te jî Maruf birîndar kiriye. Wisane?
Evv gardiyana kal, gotinen vve dizivirandin. VVer bersiv da:
Gundî hemû li vvir bûn. Di bintara re, di zeviya dibistane. Hine kan diqîriyan. Hinekan kevir dihavetin. Jin, mer, zar hemû li vvir bûn. Ezjî.
Beje te jî bi keviran, bi daran lexist? Çilo bû?
Piranî kevir dihavetin. Min jî kevir havet. Awqas.
Evv keviren ku te havetin, li Maruf ketin an na?
Ez nizanim. Xwede zane, le ket an na.
Waxta ku te kevir havetin, evv li ser piya bû an li erde bû?
Evv li ser piyan bû û berve gundiyan dihat.
Pişti çend pirsiyaren vvüo, gotinen vve jî xüas bû. Davviya gotinen herkesi, hakim li ale savvcî diziviriya. Evvî jî sere xwe bilind û işaret di kir ku tu pirsiyaren wî tunenin.
Şahid nehanîbûn. Hakim texmîn nekiribû ku gotinen girtiyan yen vvisa zûtire bimeşin. Li kaxizan niherî. Di ber xwe, gotinen şofere trak töre xwend. Nedigot ku sûce keye. Gotina axe hanîbû cî. Şofer ji hine kan bihîstibû ku ev zeviya kevir le kom kirî, bere dibistan vve le biha ta çekirine. Paşe dev je berdabûn. Le Ûsiv axa ku jere gotibû vvir jî ba jo. Ke li Maruf xistibû? nedizanî.
Jina Ûsiv axa jî vvüo. Di serde digot ku Soro xwastibû Maruf bipareze. Bi qeleme bintara van rezan cixîz kir. Nîşan da bin. Xulaman kin û kurt xeber dabûn. Di vvirde jî tiştek nedbcuya.
Ûsiv axa sûc dihavete ser hemû gundiyan. Yen pirin jî evanen gir

tî. Van küre wî birîndar kiribûn. Fate gundî dişande ser axe. «Hûn bi merîkîre seredariye nakin. Hûn çito merin?» digote gundiyan. Hakim di dile xwede qerare xwe da. We gundî hemû berda. Mehkeme bira negirtî be domkirine. Güne bûn. Cima awqas kesî di hundirde bigre? Gundî hemû dendstine der. Paşe dîsa hanine salone ku hakim qerarexwe bbcvvîne. Hakim dbcvvend, le kesî tiştek je fem nedikir. Di da vviyede «ji bo hanîna şahidan, mehkeme maye filan roje, hemû girtî
286
hatine berdane...» Ev der fem kirin. Çaven vvan dibiriqiyan. Hemû şa bûn.
Hakim, savvcî, nivîsdar derketin, çûn. We çaxe bi hevre xeberdan. Lebûn ku bifýrin. Rûye Fate bi şabûne sor sor bû. Di çaven vvede du, se dilopen şabûne hebûn. Bi desten xwe, çaven xwe zûha dikir ku So ro hate cem.
Dibe ku tu digirî, xwuha Fate?
Mibaşir çav rohnayî dida vvan. Cendirme jî, bi vvanre kefxweş bûn. Giştan tendûrekiya hez dikirin. Dijîyekî zordest bûn. Awqas derd levv ra te seren vvan digotin di nav xwede. Wan jî Soro û yen dine pîroz ki rin. Nivîsdar vegeriya hat û çav rohnayî da vvan. Ehmed, evve ku di ma liyede memur, çend caran hatibû, mehkeme teselî kiribû. Neçû xwarine, li heviya vvan mabû. Tendûrekî pîroz kirin.
Cendirman nizanibûn ku vve desten vvan dîsa kelepçe xin an na? Savvcî ji oda xwe derdiket. Zivirî:
Naxwaze. Naxwaze. Merikan hatine berdane. vVe tu birevin.
Niha dîsa evv kesan, ve çare be kelepçe di nava sûkere, serejer di çûn. Le bi lez û nîv rev. Gaven vvan şidyayî, zexm. Te digot ku diçin mizgîniye bidine hinekan.
Ji günden vvan kemasî bîst kes hatibûn. Le dereng mabûn. Rede,

hespe yekî xûlî bûbû. Çivîkek ji nav çirpiyan fýryabû. Hesp veciniqî û xûlî bûbû. Cîrane vvan li erde ketibû. Hesp reviya û cîran di nav eşede mabû. Çend kes li pey hespe ketibûn. Ji pare, çend revviyan alî ki ribûn û hesp girtibûn. Ji ber eşe, hevale vvan dereng mabûn. Girtî ku ji mehkeme derketin, gundiyen vvan gihîştine û xeber bihîstin. Hevdu hemez kirin.
Te digot ku Fate reve naçe, difire. Rede, Ferzende li gund, Seyîtxan li girtîgahe, li ba hevalen vve, xenji vvan tu tiştek nedihate bîre. Ni ha ji meraqan terqiya Seyîtxan. Kî çi zane çiqasî li pey min giriya di got di dile xwede.
Sûk qedya û ketine riya girtîgehe. Nobedar bi sungî li ber qilûba xwe dihate xuyane. Di paşve, girtîgeha jinan te dîtine. Li piş vvan jî, dûrve, çend malen nû çekirî. Pirî, yen ku nû hatine bajer.
Wisa zexm li deriye derve dbdstin ku... Te digot ku vve bişikenin. Ji ale dine, gardiyan bi mifte derî vedikir, 16 kesî denge wî nedibihîst. Lavvo bisekinin. Hûn terqiyan, çi bû? Ez zanim, ez zanim. Hûn berdane. Wisa nebûya, deste vve ranedibû ku hûn li derî xin.
Li pey hev ketine hundir. Le bûn ku gardiyan bidine ber xwe û bi xwerc bibin. Yen ku xurek çedikirin an jî dbcvvarin, nîvcî hiştin û komî
287
dora vvan bûn. Hinek, vvan hemez dike, hinek deste vvan digre. Sergar diyan û nivîsdare girtîgahe jîji ser xwarine rabûn. Hatin û evv pîroz ki rin. Hemû bi hevre şa dibûn, Çend kesan pirsîn ku «çilo bû?», «kes ji günde vve hatibûn?», «axa jî hatibû an na?», «hakim başbû?». Di pey vvan, tendûrekiyen cîrane vvan gihîştine girtîgehe. Nivîsdar kaxizen berdane kire nav ewraqan. Deftereke mezin vekir û qîrya:
Zû, zû. Tivdareken xwe bikin. Beşe hûn di hundirde man. Der ve, li heviya vvene.

Tendûrekiya di lezekede nivînen xwe peçandin. Kiras û kincen ji hevalan sitandibûn, ji xwe kirin. Didane xwayen vvan û henek dikirin. Meriv ku hespe xelqe sivvarbe, paşe zû peya dibe.
Tişten xwarineye mayî dane hevalen xwe. Ye pir jî Bekir û Xalis hildan. Te rûyen vvan herdu hevalan bidîta. Kesek çavva him şa dibe û him jî bi ber xwe dikeve... Wekî şeveke du nîvî. Ji bo berdana dosten xwe şa dibûn. Le, wisa hînî vvan bûbûn ku ji biran jî zedetir. Hine ti şten xwe, ji girtiyen feqîrre hiştin. Hinek girtî pir şa dibûn. Mînanî ku evv bi xwe hatine berdane. Le kes nizane ev çiye. Hinek jî, ber ku di hundirde diman, dibcemgîn bûn. Di dilen vvande janek hebû. Ne mî nanî çavnebariye. Le dîsa jîşa nedibûn.
An ser bine girtîgehe li tevî heve. Hevde kes kare xwe dikin ku he rin. Yen mayîli der dore vvanin. Hev hemez dikin, maç dikin, desten hev digrin. Ji hev diqetin. Nîv saetîgirt, xatir xwastina vvan. Deste ser gardiyan maç kirin. Soro ku ji gardiyane qelew û terikîxatir xwast, hi ne pere kire berîka vvî. Ne pir zede bû. Le, di deste vvande tunebû. Edet vvisane. Nivînen xwe li ser eşîga derîre kaş kirin û dendstin. Ev jî edeteke dineye. «Careka din nezivirin û nekevine girtîgahe», mena vve eve.
Li peş girtîgehe vvekî duan û davveteye. Bi hevre bûne nezikiya çil merî. Hevdu hemez dikirin û şa dibûn. Yek dihiştin, diçûne cem yekî dine.
Xwarziye Soro ji ale girtîgeha jinan dihat. Nivînen Fate havetibû ser milen xwe. Tişten dine di destde bûn. Di pey wî Fate dihat, deste vve di deste Seyîtxande bû. Li pist dizivirî û li hevalen xweyî mayî di niherî. Çaven vve bi hesir bû. Seyîtxan hemez û maç dikirin cîranan. Wek biran, bi dostî hale Fate dipirsiyan. Yek ji vvan:
De ha, zû bikin. Xeberdane bihelin. Em tekevine re, got.

Hine nivîn li hespan kirin, ye dine jî, vve bi dor hilgirtana. Elî bi du hevalanve, vve biçûna bajer. Nan, pener û tirî bikirîna. Li ser kaniye, rede, vve bi hevre bbevvarana. Ji sibede birçî bûn, tiştek nexwaribûn.
288
Wek tene davvete û dflane. WUo hatine gund. Tarî zûve ketibû er de. Ve şeva payizede, te digot ku koçen koçera bi re ketine. Bi deng büind xeberdan, henek. Hinek di bin barande xwûh dane. Ku hatine gund, nava qasekede hemû U ser piyan bûn. Jin, zar, hemû kes hişyar bûn.
Fate, Seyîtxan û Elî ku hatme ber derî, gelek caran li derî xistin. Eh* derkete ser xanî û di kulekere ban kir:
Xaltiya Zelexan. Xaltiya Zelexan. Deri veke.
Derî da vekirine. Kirase vve fireh û direj. Xwe bi dîvver digirt. Des te vvede lemba nifte. Xaltiya Zelexa derî vekir. Pore vve bela bela bû yî. Çaven vve, ji xewe venedibûn. Ve şeve ev kine? Denge Elî nas kir.
-Elîtuyî?Xereînşalla?
Veke. Veke. Xere xaltiye. Xere.
Lembe bilind kir û li pist Elî, Fate û Seyîtean dît.
Way... Way... Hela le. Hela le.
Desten vve diricifiyan. Heke ku Elî negirta, lembe li erde diket. Se re Fate da ber sînga xwena şest salî. Bi şabûne, nizanibû çi bike.
Way keça mina delal. Way ronayiya çaven min. Way delaliya min. Qîza mina dijvvar.
Li ale Seyîtxan zivirî. Rû, dest û pore wî maç dikir. Bi şabûne, ni karibû bipeyive. Yek radimûsa û paşe dizivirî yen din. Waxta ku tev çûne hundir, Elî nivîn û boxçe vve danî erde.
Fate hela he li derve fem dikir ku mala vve di revvşeke başdeye. Li

ber derî wisa dbcuya. Dema ku çû hundir, dît ku vvisane, raste. Ji qelebalbc
û dengen vvan, Ferzende nîv hişyar bû. Çaven wî rind nedihatine vekirine. Diya vvî:
Ferzende. Ez qurban. Ez heyran. Hela mezeke. Binher, kî hati ne?
Denge diya xwe nas kir. Rabû, hat, xwe havete hemeza vve. Ferzen de di hemeza diya xwede. Seyîtxan deste biraye xwe girt. Rede hema usa xewa wî dihat. Niha piçekî li ser xwe û hişyar bû. Deste biraye xwe bir çû li ser lev û rûye xwe. Ferzende hate jere. Evv û Seyîtxan, desten vvan di deste hevde, çend gav ji diya xwe vvan dûr ketin. Ku kare Elî nemabû edî, destura xwe xwast û çû.
Rojtira dine di gundde şeni hebû. Di davvet û düanande jî ne vvisa bû. Hemû, ji zaran heta kalen nava ciyan, jî duşa û kefxweş bûn. Çav ronahî didane hevdû, pirsen serîn ji hevre digotin. Li ber deriyan, li bin dîvvaran û li ser kaniye. Li her dere. Diçûne malen hev, tev dbcvva-
289
rin, tişten serîn dişandine malen hev. Li maleke rûdiniştin, xeber di dan, paşe diçûne maleke dine.
Ve deme, li mala Ûsiv axa, bekefi" û dünepakî hebû. Nîve şeve, me riven vvî, berdana girtiyan û hatina vvane gund ji Ûsiv axare gotibûn. Wekîîsote tûj bû. Le bû biterqe. «Van benamûsan çend mehan di hun dirde bigre û paşe berde. Qet meriv pere serederiye dike edî. vVe her betir har bibin», digot di düe xwede. Küre wî van roja qet nedihate kişandine. Jina wî jî pirsen sar û tel digot car caran. «Xwede bela vve hemûyan bide. Ez li ber çaven vve gişta, wekî kelemekîme», digot Ûsiv axa. «Küre kûçikan, ji minre îran zevt kirine. Sibe ji teşexuza vvan na ye derbas bûne. We şewqe xwe bidine alîkî. Dibe ku pirsa jî, ji minre

bejin. Ya ne baş evve ku edîji girtine jî natirsin. Min da kutane, nebû. Da girtine nebû.» Xewa wî revî. Heta sibe li ale çepe zivirî, gundî ha tine peş çavan, ale raste zivirî dîsa evv gundiyan hebûn. Berbanga sibe ku raza, vve çaxe ji gundiyan xilas bû.
Cîranan fedî dikirin ku dirane Tahirî şikestî bipirsin. Neynûka So ro ve çare xilo xwarî derketibû. Soro û Tahir evv zûve ji bîr kirin. Evv rojen bere, niha gelekî dûr bûn.
Jina Soro vve şeve, neynûke mere xwe meze dikir û deste wî bire ser ruye xwe û giriya. Gelek tişt bihîstibû di derheqe tiliyen Soro. Xwede ji vvanre nehele. Bira gişt qurbana tebin, got û xwe nezî mere xwe kir.
Paşe, rojen dine, hemû çûn ser karen xwe. Ji günden der doran, dost û nas hatine dîtina vvan. Tendûrek bi çendekîşa bû. Kalike Şakir gelekî kal û pir ser xwe nîn bû, levvra nehat. Neviye xwe şandibû mala Soro. Şekir û çay kiribû heqîwa neviye xwe. Sibe hat û evare vegeriya neviye vviyî xort. Ji günde Cemal û Zubed axa kes nehat. Günden do ra vvan hatibûn çend kes. Wanji tendûrekiyanre digot ku li hatine, peş esre derbas bûne. Ji günden Cemal û Zubed axa jî, hine gundiyan silave xwe şandine. Wüo nîşan dida ku ji Cemal û Zubed axa ditirsiyan. Çav ronayiyen xwe gotibûn.
Hinekan wisa zanibû ku ev bedengî û be bûyerî vve vvüo here. Piren jî yen ku nehatibûne girtine, texmîn nedikirin ku Ûsiv axa derden nû dence. Le Soro û hevalen din ne vver bûn. Sika dile vvan roj bi roj ze de dibû. îro anjîsibe bûyeren nû texmîn dikirin. Rewşa gund, van penc mehan, çilo bû? Yek bi yek hîn bûn.
Xale Mihe derneketiye nava gund. Li rûye kesî neniheriye ji şerma. Cara peşîn jî, cima wisa nekir? Qet nave wî abûqatîjî nebihîstibûn. Wî evv birin û pere dane abûqat Fihat bege. Tu cara reke baş bi gundiyen

xwe nişan nedabû. Fate roja peşîn dij derket, le kî guh dide pirsen ji nan? Paşe ku hertişt li tevî hev bû, xale Mihe fedî kir û li gund nema. Riya bajer da peşiya xwe. Kesî texmîn nedikir ku piştî ve çûyine, xale Mihe bijî. Li bajer kî qedir, qîmet dide vvî? Kar û pere wî jî tüne. Ti ştek ji deste wî naye. Li bajer qîmet didine kûçikan, le nadine kesen avvha. Merivekî kal, awqasî tamîş nabe. Weji qehran bimire.
-XXXIXÛsiv
axa edî zeviyen gund hemû, yâ xwe hesavv dikir. Hinek ji vvan herg kiribûn, çandibûn. Mînanî zeviyan dine, ye gundiyan, îsal tiştek hilneda Ûsiv axa. Ye mayîn, îsal herg kiribûn. Perçek, düden piçûk mabûn. Birîndar buna küre wî û karen dine nedihîşt ku her tişt di ri ya xwede here. Le meriya dikaribû niha bajo û dema ku berf rabû, ge nim baveje.
Zeviyen gundiya gişt bi tevî hev kiribû. Bûne zeviyen mezin. Ten durekiyan ku li zeviyen xwe dinherîn, dile vvan dbceriqî. Serda jî tu hidûd di nav zeviyande nemabû niha. Bere, ji bo bihusteke qîyamet radikirin, mer dikuştin. Le niha? Hidûd, midûd tiştek nîn bû. Zeviyen be hidûd. Mena ve eve ku zevî tunenin. Tiştekî vve edî tede tüne. Paşe ev behevitiya vvan dîsa vvinda dibû. Axa çiqasî jî zeviyen vvan tevî hev bike, meriya dikaribû ciyen xwe nas bike. Bi salan li ser kar kirine, pere dest, piyen xwe tiş tîşî kirine. Hemûyan yen xwe bihust bi bihust zanibûn. Hema bira bi deste vvan bikeve beşe. Gav bi gav, evleg bi evleg, vve nas bikirana. Meriv keda deste xwe çavva ji bîr bike? Xwîya eniya xwe retiye. Meriv nexerîwe erde xweye. Weke meriv li bûkeke,
li keçeke xama dinihere. Wisa ü erde xwe neniheribûn tendure kiyan? Levvra, çaven xwe bigirtana jî, herkesi ciyen xwe baş nas dikir.

Le Ûsiv axa... Ji bo van zeviyan, bi hemezan pere wî çûbûn. Küre vvî, di ber çaven vvî, lebû bihata kuştine. Birîndar û nîvcî mabû. Rewşa mala wî nemabû. Jin, zaren wî li ber çavan reş bûbûn. Ji hemûyanre mene didît, dieşand û diqîriya. Tu tama xwarin û vexwarine pere ne mabû. nedbcvvast ku rûye gundîkî bibîne. Te digot ku xwe bi xwe kiri ye girtîgehe. Mala wî ji malan dûr, xenji çend xulam, şofer û du, se biraziyen
xwe kes nedidît. Cara ku diçû bajer, hinekî bîhna wî vedibû.
Rojen dine, mînanî hev bûn. Tu guhartin nîn bûn di ve jiyanede. Di gundekîde, le di dinene dinede dijiyan herdu alî jî. Bedena Ûsiv axa ne mîna bere bû. Be xisyet û pir tamîş nedibû edî. Tüyen wî qut bûn.
291
Bîhntengî û eş dikete sînge vvî. DUe wî caran pir zede ledbdst. Gelekî aciz dibû. Dema ku ber xwe diket û diqehirî, eşeke giran li ser müe çepe dest pe dikir. Dest û tiliyen wî diteviziyan.
Car caran xwe jî, ev reya ku girtiye, qawîl nedibû. Nedikete hişe vvî. Rewşa wî çi baş bû. Bere, gotineke wî nedibû dudu. Xazüa qet vveha nekira. Wisa düikirî, le penc deqîqa şûnve, te digot ku deste wî dişe vvitî, xwe şûnve dikişand. Van fikran ji bîra xwe dihavet. Tobe û îstbcfar dihanî. Yekî bidîta, vve bigota ku Ûsiv axa dîn bûye, xwe bi xwe xeber dide.
Eşeke cane wî jî evv bû ku bi Zubed axare ü hev hatibû. Bi mehan, li her deran ev kara hatibû xeberdane. Tu karek jî je nedîtibû. Eşo du se cara guUe havetibûne gundiyan. Qet telaşa kesî nîn bû edî. Cima xwe gazî Eşo bikira, çend paqnot pere bidane, Eşoye dîsa wisa neki ra? Him jî mîna keran. Paşe Ûsiv axa dîsa poşman dibû. Min rind kir. Himjî gelekî rind. Mînanî poçika golike ne kin dibûm, ne direj. Gun diyen bajon û biçînin. Paşe yen bînin para min bidin. Qet nabe tu ti

ştî. Küren xelqe bi makînan kar dikin. Maleke vvan li bajer û yek li gund. Ez di Tendureke, vanen be dîn, be îmanve ketime xelaye. Na lo. Na lo. Ev ne tu kare. Min ya herî rind kiriye ku dersa vvan daye vvan. Niha vve herin li ser qûna xwe rûnin. Him jî vvekî kûçikan. We hîn bi bin ku dine çiye. Kî bela xwe diðere edî? Cima dîn bûne? Hela bira saleka din jî zevî mînanî îsal tiştekî nedin. Qet yek jî namîne li gund. We revî revî herin. Pist xwe jî naniherin. Evana hemû di hişe vvîde te vî hev bûn.

Dbcvvast ku van roja xebere bide gundiyan, para xwe, dehan yeke xwe bbcvvaze. Gerek vvan wisa nede hînkirine. îsal nebe, vve saleke din xwe ü erde xin, heqe wî nedin. Bira kembe. Çi dibe bira bibe. Le bira heqe vvî, li ser vvan nemine.

Van rojen havîne henik û serînin. Germa havîne ya ku meriyan difetisîne tunebû edî. Fekî pirin, kar her diçin kem dibin. Davveten xort û keçan, van rojan te kirine. Hefte careke, deh roja careke denge def û zirne te, ji günden cîran. Ten gazî hevdu dikin. Du şalin li Tendure ke def, zirne bi dil nehate lexistine. Yen ku keç û küren xwe dizevvicandin, dîlanen be mesref dikirin. Pire vvan feqîrin. Her betir feqîr bûn van dü, se salande. Tu rojen xweş û rehet nedîtin ku van di salen da vviyede, îca serde dflane çekin. Mesrefen giran dbcvvast tişten avvha. Bi şevan sar dibû edî. Berve evaran ezmane heşîn her diçû tarî û gevvr dibû. Meriya qemîş nedikir ku meze bike. Kesî nikaribû edî, vvek havîne, li ser xaniyan raze. Merî diricifî. Gelek gundiyan tivdareke zi-

292

vistane dikirin, kemasiyen xwe dihanîne cî. Bi dilnerm dest ve payize kirin. Le qet halekî başde nîn bûn. Gelo cima van rojan vvüo bi kef û düges bûn? Ji zeviyan tiştek hilnedabûn. Gundiyen vvan bi mehan di girtîgehede mabûn. Le hemû bi hevre hatibûn. Dostî û bavveriya vvan

ji bere zedetir bû. Hevîke mezin di düe vvande hebû. Bi van hale vvan, hemû gundî kebcvveş dibûn. Levvra wisa düfîreh û rehet bûn. Hemû cî ran mînanî malen xwe, diçûn, dihatine malen hev. Tev dbcvvar û henek dikirin.

Di ale gundiya çiqas kefxweşî û rehetî hebû, di ale Ûsiv axa jî avvqas diltengî, nerehetî hebû. Ev gundî dbcvvazin ku min biterqînin, levv ra wisa dikin, bi ken û kefin digot, Ûsiv axa di düe xwe de. Ev xer naxuyane.

Küre keran. Küre kûçikan. Tu dibejî ku ji hec hatine. WUo bi kef û bi kenin, digot.

Van du salande edî deve Ûsiv axa şevvitibû. Heyvvanen xwe bi du caran dida jimare. Xulam û şivanen xwe şîret û hişyar dikir. Traktör li ber derî, li ciye xwe disekinî. Du kuçiken mezin û har ji ber derî nediqetiyan.

Tirsa gundiyan ji dile wî dernediket. Li ser xwarine tirs. Ra zane tirs. Tirs û tirs. Odede, ciye xwe ji pencere dûr, li quncikande radbdst.

Hertim çaven wî berve pencere bûn. Ku biçûya cîkî, dizivirî li pist xwe û li dora xwe meze dikir. Caran jîji hukumatere dida xebera. «Cima lenaxe, vvan dernaxe? Ez jîxüasbim, hukumat jî.» digot.

Ûsiv axa Şükriye nobedar şande cem gundiyan.

Here hemû malan. Heta niha zeviyen min ajotin, çandin û hildan. Nehanîn û heqe min nedane min. Bo ku ez zeviyan bidime vvan, lava kirin, hustiye xwe xwar kirin. Ji ser xermananre awqas wext der bas bû. Hela he tiştek nehanîn. îsal zevî ne rind bûn. Ez jî zanim. Çi hatiye, ez jî awqasî dbcvvazim. Heqe min çiye, awqasî. îsal mîna par nîn bû, le dîsa jî çandin û hildan. Ji giştanre beje. Beje ku Ûsiv axa vver digot.

Kare Şukrî zehmet bû. Dema ku diçû cem gundiyan, li rûye wî nedinherîn. Te digot ku bîzen vvan te. Kesî, «hela vvere rûne» nedigot.
Silava xwede nedidane Şukrî. Ji bo dardekirine, meriv çilo naxwaze nezî bende xeleq bibe, Şukrî jî vvüo nedbcvvest here ba gundiya. Lin gen wî nediçûn. Hat berderen cîranen xwe:
Çiye Şukrî, dîsa çiye?
Qet. Tu tişte tüne cîrano. Xwede ruhe min nesitand û ez ji ve nobedariye xüas nebûm.
Beje. Beje. Ve çare çiye?
293
Ûsiv axa dibeje ku zevî xwastin min da vvan. Zeviyen nû çekirin. Paşe çandin. Nehanîn, heqe min nedane min. Kem an zede, çiye heqe min, bira bînin bidin. Dehan yek kod nîne? Nîv kodbe jî, ez heqe xwe dbcvvazim. wisa dibeje.
Evv deriye peşin bû. Cîrane Şukrî qaseke sekinî. Nedbcvvast ku her sa xwe nîşan bide.
Şukrî, ev axe te, qet fedî nake gelo? Şerm nake? Me çi hüda ku em çi bidine vvî? Meriv hevvekîşerm dike. Me toxime çandî şûnve hüneda.
Hela ka eme îsal çi biçînin? Be toxim mane. Paşe, evv ciyen ku me ajotine, ji ku yen Ûsiv axane? Erde gund tevayîne. Ciyen ji bo çera heyvvanan bûn. Heyvvanen gund. Me pere çerme bedena xwe qetandin, ajotin, kirine zevî. Nihajî te dişine ser me, bira para min bidin.
Ji vvîre beje ku tiştekî minî bidime Ûsiv axa tüne. Hebe jî nadim. Jere vvüo beje. De, tu li ser seran, ser çavan hatî.
Birabe cirano. Çi gunehe min heye? Ji min gotin. Dayin û sitandin di nava vve û Ûsiv axadeye. Ez di navde xirab dibim. Gunehkar di bim.

Na. Na. Çi sûce teye? Kî wisa dibeje? Na xer. Tiştekî vvüo tüne.
Evv te dişine.
Wexta ku Şukrî sebebe hatina xwe got, li mala cîranekî dine, le bû, be kutane.
Tu jî, Ûsiv axa jî. Hûn vvekî teyren cendekxvvurin. Mirîjî, ji des ten vve xilas nabin. Li dora cendeken mirî diðerin hûn. Ve çare ji vve re, qet tiştek tüne. Teyren cendekxwurno. Çi gû heye ku Ûsiv axa bepar maye? Birçîbûna me ne besî meye cima? Ji axe xwere beje, bira mîna merivan di ciye xwede rûne. Devva çi heqî dike? Heqe wî tiştekî dineye. Tujî he ku sere min nehavetiye, dûrkeve. Biteyse here. Bicehme Şukrî.
Şûkrî cîrane xwenî tir cunî, rind nas dikir. Pere henek nedibû. Tu li ber daynî nabe, li şerre bigrî nabe. Bedeng, ku mala wî terikand rû ye Şukrî nedihate naskirine. Ev çi bela bû? Nedihate kişandine. Van cîranen dînok, cima ji wî diqehiriyan? Cima tu ez ji xwere dbcvvazim? Lo xînzîrno, dîsa eze bidime pişta xwe, bikişînim. Kişandina li enbare jî, hustiye mine. Eze di binde biricifým. Cima ez bi kefa dile xwe teme cem vve? Şukrî him diqehirî û him jî vvüo difikirî. Wexta kû hate ber dere Fate, evve di hevvşede, nava teyştekede sere Seyîtxan dişûşt û Fer zende jî av le dikir. Fate sere xwe bilind kir, Şukrî dît. Savvûn di sere küre xwe dida. Ji Ferzende re:
Ave leke, küre min, ave leke, got.
294
Alîkîde kare xwe dücir, li ale dineve Şukrî guhdarî dikir Fate. Pişta xwe rast kir. Dieşiya. Desten xwenî şil dane ser pişta xwe.
Here Şukrî. Tu jî devvsa biraye minî. Here jere beje ku... Fate dibeje ku ez qet kîre küre xwe jî nadime. Evv hevv dizane ku me ve kûçelaniye,

ve rezfltiye hela he ders negirtiye? Evv derbas bûn. Evv çûn.
Ez libek genim jî nadime vvî.
Seyîtxan çaven xwe miz didan.
Daye. Daye ez cemidîm. Ave ü minke.
Şükriye nobedar bi hefte heft peşiyen xwere tobe dikir. Careke din jî tevî karekî vveha nebe. Pirsen vvekî jehre bihîstin îro. Tû bikirana li rûye vvî, ji vveya baştir bû.
Bi ya Şukrî, Soro ji hemûyan nermtir bû.
Hela vvere Şukrî. Çavvayî? Başî?
Saxiya cane te dbcvvazim Soro. Başim ve gave. Cima tu nizanî?
Hale me vvekî hale kûçikane. Ku tu ji min bipirsî, ji hale kûçikan jî xirabtir. Ne şev heye ne jî roj.
Ber xwe nekeve. Jiyan hemû vvisaye. Ye me hemûyanjî mîna te.
Çi ferqa me heye? Ûsiv axa çavvane? Le Maruf?
Evvjî başin Soro. Di karen xwedene.
Paşe sekinî, vve çi bigota?
Maruf li male. Başe. Ne di nav ciyandeye, le dernakeve der. Pir ber xwe dikeve. Deve wî hatiye kişandine. Nikare xeber bide. Tu bibî nî, gunehe te jî vve pe be. Wisa perîşane ku.
Raste. Ku ez nîn buma... Xilasbûna wî tunebû. Dîsa jî bave wî ye be îman, her tişt ji min dizanî.
Jina vvî, ji tere dua dike. Çend caran min bi xwe bihîst. Soro nebûya Maruf kuştibûn, digot.
Çi dbcvvaze van rojan? Dbcvvaze ku em ji gund deren? Qet hişe ke hildide? Qet em gund dihelin û diçin? Bere diçûn, le ji vir ha, bavvar nakim. Qet yek jî naçe. Tu dev ji van berde. Zeviyen te jî îsal tu tişt nedan. Axa ji zeviyen kevn dane te. Le dibejin ku te jî kem hüdaye. Ber xwe nekeve. Ev qedera me gundiyan vvehaye. Zike me ter na

be. Zevî û merg başin le heyvvan dimirin. Anjî heyvvan başin ve çare zevî bexerin. Tu diniherî hemû baş diçin, îcar selaf te, bi erdere dike yek. Ji alîkîde tiştek te ji bo zirare. Hela tu beje, Bo çi tu şandin? Got û cbcarek direjî Şukrî kir.
Şükriye nobedar, ji vvîre jî got, vvekî cîranen dine. Soro bi nîvken, cbcara xwe kişand û neynûka xwene xüo xwarî niherî. Evva ku li qere-
295
qole kişandibûn. Te digot ku ana dîsa ji kokeve kaş dikin. Wisa diha te bîra vvî.
Gotinen min ne ji bo tene. Nexeyide. Hilnede ser xwe. îro tu qasidî di nav mede. Bi van gotinan, vve ke bbcapîne? Cima tu ji kîse bave xwe zevî dane me? Heta îro, evv deran ji bo çera heyvvanen gund bûn. Ana me kiriye zevî. Evvî dbcvvast ku em vvan deran vekin, kar bikin û texine zeviyen be kevir û kuçik. Paşe jî be, li zeviyan bibe xwayî. Wekî zeviyen dine. Ne ji zeviyen bere û ne jîji vanen ku me nû kirine zevî, em bihusteke jî nadine vvî. Bira herkes bi edeb û namus, li ser erde xwebe. Van gotinen min, wisa jere beje. Beje ku gundî qebûl nakin. Heqe axe ne li ser zeviyen kevn û ne jî li ser zeviyen nû hene. Bira em yen xwe evvjî yen xwe bajon. Cîrantî, heq, merivtayî vver dibe. Min tu gelekî dereng xistî. Bira, tu li ser seran hatî. Wisa Şukrî. Tu tiştekî me tüne ku em bidine vvî.
Şukrî cbcara xwe qedand. Ferq kir ku ne mina gava dine bû. Hine kî betir nerm û dü henik bû. Oehra wî kem bûbû. Ev Soro çi kesekî başe. Çer xweş dipeyive... Evven dine, tu dibejî ku meriyanre didine çera. Didine xeberan. Le evî çûr ne vvisane. Zane ku çilo te xeberdane. Bi Şukrî xwere vvekî bere qise kiribû. Beteşe, beteşe xeber nedabû. Li zimane xwe xwayî bû.
Şukrî ku qeraren gundiyan ji Ûsiv axare got, Ûsiv axa sor, heşîn bû.

Desten wî ricifiyan.
Çi, çi? Hela tu li van benamûsan binihere. Zeviyen kevn û nû jî, yen vvanane. Heqe vvan bûne. Way ez de û jina vvenim. Way ez deve peşiyen vvenim. Tobe. Tobe. Kuro, evana dînin, be hişin? Çine lavvo? Dîsa eşe pe girt. Sînge wî dieşiya. Ya rastî ev bersivan nedieciband. Bereve texmîn dikir. Le dîsa jî te digot ku tişten nû bûne. Wilo qehirî. Meriyen male, ditirsiyan ku tiştekî bejin.
Ji bo sihete te ne başe. Neqehire, got jina vvî.
Le Ûsiv axa wisa bi serde qîrya ku feqîre edî deve xwe venekir. îro jî wisa dest pe kir. Jina Ûsiv axa ji dûrve, bi düşikestî li hale mere xwe meze dikir. Di eniya vvî, dilopen xwîya sar dbcuyan. Jine dîsa deng ne kir. Eniya wî mîna gava dine reş, heşîn nîn bû le spîçüokî bû. VVek kaxizeke
sipî.
Hela hinekî bi hemde xwebe Ûsiv axa. Mezeke çilo bû renge te? got jina vvî. Le ve çare, pere neqiriya. Dbcvvast ku jina wî û yen dine alî vvî bikin. Jine dest girt û nermik evv da rûniştandine.
Ev kes cima avvhane? Bûyina tiştekî naxwazin û le bele texmîn di kin. Paşe jî li ber ve bûyine perişan dibin. Gelo meriv cima dbcvvazin
296
ku xwe bi xwe bbcapînin? Em cima li peş van tişten ku em texmih di kin, vvüo şaş û metel dinlinin? Cima? Cima? Ji hevvîrdora merivan, evv ciyen û kesen ku em di navde mezin bûne... Ji dûr û firehtiya dîtina kesan... Xenji van hela he jî gelek tişt hene.
Şukrî gotinen gundiyan ji Ûsiv axare got. Paşe gundî ku dihatine ba hev, ferq kirin ku hemûyan mînanî hev bersiv dane Şukrî. Levvra düteng nîn bûn. Ji hev neşivverî, dîsa jî vvekî hev didîtin. Bi dîtina vvan, ev bersiv bi aqü û baş bûn. Te digot ku yekî hînî vvan kiriye. Ne bi hers

bûn. Wan jî dizanibûn ku Ûsiv axa vve xwestinen avvha bide peş vvan. Kesî tiştek nedida. Bi serde jî, tu heqe Ûsiv axa li ser zeviyen kevn û nû tunebûn. Oerare dile vvan wisa bû.
vVe şeve Soro, Mîro bi hevre bûn. Paşe gazî Seîd û Oasim jî kirin. Gelo van rojan vve çi bibin? We çi bihata kirine? Li ser van peyivîn. VVilo bi hev şevvirîn ku di nav cîranan, malan bi vvanre qise bikin. Wisa dihate xuyane ku gerek meriv bi tivdarekbe. Xenji tanûşbûne û dij sekinandine re nedbcuya. Davviyede, Ûsiv axa ku neye re, vve berî vvî bidana, ji gund dendstana. Levvra bi her alî qise kirin baş bû. Bi teva yî û hevre nebûna, vve her tişt vvinda bikirana.
Rojen pey, di malan, bi van xeberdanan derbas bûn. Şabûna vvan direj nedikişand. Meriya rind fem dikir. Jin, mer, hemûyan texmîn di kirin ku tişten bibin. Kesen mala Ûsiv axa jî vvisa. Fem dikir meriyan. Le bi çavan nedihate dîtine. Mala axe jî di şik û meraqede bûn. Car caran meriv xeteran li nezîxwe nabîne. Ya rastî, naxwaze bibîne. Kemasîke
herî mezine. Meranî, dijvvarî, nav û deng. Kesen ku li pey van tişten avvha dikevin, evv xelqen ku hela he di bin van dîtinande dijîn, piranî vvilone. Caran jî ne vveha. Re namîne ji bo reve. Bo ku tirsa di le xwe damirîne, meriv naxwaze xetere bibîne. Di dile Ûsiv axade, ev herd cure jî hebûn. Nikaribû edîji nîve re vegere. Berî her tiştî, evv axa bû. Li peş gundiyan, şûnve gav havetin, ne kare axan bû. Axa, gere axatiya xwe bizanibe. Xilasbûn, edî tunebû. Li her dere û li her wexte, vve Ûsiv axa rezîl bikirana. Be rûmet û be qîmet. We serhevdenen vvisa bihanîna sere vvî. We evv tekirana hezekeke vvisa... Çi di desten vvîde heye, gişte biçûya, vvinda bibûya. We di davviyede biketa bin desten xelqe.
297

-XLHine
zevî hebûn, li feza riya Züane. Nîvcî mabûn, nehatibûne ajo tine. Ûsiv axa ajotina vvan, bi şoferre teme kir. Şofer heta evare kema siyen xwe hanine cî û sibeh zû çû li ser kare xwe. Çend caran di berre derbas bûbû, zevî rind nas dikirin. Li hemberekî nizmde bûn. Zûve di hatine çandine. Zevî edî vvestiyabûn. Le dîsa jî Ûsiv axa van zeviyan pir hez dikir. Nedihatine avdane. Kemasîke mezin bû eva. Tiştekî din jî hebû, erde vira ne hişk bû. Wexta ku baraneke giran bari, ev erde nerm bi xwere hildida û dibir. Levvra hine salan, zevî di ser hevde radiziya. Caran genim di bin hevde diriziya. Kevir tunebûn di van zeviyande. Direjayiya vve, du se caran qasî bera vve bû. Bere se, çar malan ev der diajotin. Hetanî hidûde Zîlane diçe. Di nava vvande aveke pi çûk derbas dibe. Hine salan ev ava zûha dibe. Li ser hidûd, tendure kiyan û zîlaniyan dilen hev dişkenin, le ne wisa zede. Herdu aliyan, dî sa jî hidûd rind zanibûn. Ûsiv axa dbcvvest ku vîhemberî hemû teke zevîke.
Dîtina xwe ji şoferre got. Şofer qebûl kir. Eva, ji vvîre jî hesan bû. Ûsiv axa du, se saetan li pey şofer, dbcvvest ku bi xwe here vvira û bi çaven xwe bibîne. Nedbcvvest ku bi şaşî, tekevine hidûde züaniya. Zûde li hespa sivvar nebûbû. Dile wî xwe jî dbcvvast. Hespe kumeyt, zûve di xamede bû. Kes le sivvar nebûbû. Di nav goştde mabû. Küre Ûsiv axa, ye piçûk û xulam ku evv dibirine avdane, düeyst û dbcvvast ku xwe ji desten vvan dence. Bere, Ûsiv axa ku li ser zîne çerkezî, hespan sivvar dibû, ji dûrve dihate nas kirine. Ji bereve, ji wexta bavede, hes pen rind hez dikir. Ve male, ji zaran betir li hespan diniherîn. Le eva çend şalin ku kes edî vvekî bere guh nade. Dîsa jî hemû axa, xwayî hes pe rind, zîn û gemen çerkezî anjî spanîne. Hespen ereb, hertim diha tine gotine.

Van rojan li gund hevvake giran hebû. Her roj û her saet, yen ji gir tîgehe hatine berdane, cîranen xwere dipeyiviyan. Qala kesen ku ji bo sere erde kiribûn û hatibûne girtine, dikirin. Yek, dudu jî didane ser. Te digot ku yen nehatine girtine, ber xwe diketin, cima em jî bi cîra nen xwere, di hundirde nîn bûn... Li dijî axan, cînen dine jî gundiyan şer dikir. VVUo digotin. Paşe, dihatin û digotin ku Ûsiv axa ku neye re, eme berî wî bidin, ji gund denrin.
Niha çaven hemûya li ji gund havetina Ûsiv axa bûn. Çilo bikin, çer bikin ku wî ji gund denrin? Çi tiştekî xerîw bû. Bere ji bo ku erde xwe
298
vvinda nekin, wisa bijîn. Levvra gund terk nedikirin. Ana, pişti du sa lan, ve jî naxwazin. Berî Ûsiv axa bidin, ji gund denrin. Niha düe vvan bi ve dikeliya.
Gelo bikaribûna an na? Gelo heqe vvan hebû, an na? Ya rastî kesî awqasî dûr, direj nedihanî bîra xwe. Car caran li ser difikiriyan, le vvilo kiribûne hişe xwe. Bi qerar bûn. Di düe xwede hevî dikirin ku vve pe bikaribin. Nüýa ne vvekî bere bûn. Hinekî betir rihet û be tirs bûn. VVisa zanibûn ku gerek wisa bikin. Karen vvan eve. Reke dine tüne. Tirsa vvindakirine bi vvanre nîn bû. He zanibûn ku eva deyne hustiye vvane. Levvra kesî nedbcvvast ku vî karî teke hustiye yekî dine. Bi xwe, xwe dbcvvastin.
Gundiyan dit ku li feza riya Zîlane traktör erde dajo. Erden resen ajotî li dû xwe dihele. Banî hev kirin. Xeber dane hev. Derketine ser xaniyan û meze kirin. Ûsiv axa li hespe sivvar û li cem traktöre dihate xuyane.
Hemûyan dar û çoyen xwe dane desten xwe. Mîna cara dine, nebû pir qîre qîr. Berve riya Zîlane çûn. Ne vvekî çûyina her roj bû. Bi hers û lez dikirin. Hinekan şiven xvve ba dikirin. Çend zar jî tevî vvan bûn.

Re evv gişt hünedidan. Hema, hema gund bi tevayî diçû. Wekî pelen piçûk. Ji mala axe, kur, jin, bûka wî û yen dine pare li vvan diniherîn.Di nava vvande, pesîra Soro vekirî û darekî mezin di destde bû. Bi gaven fireh diçûn. Çend cîranen wî zanibûn ku debancejîli piste heye. Xwarziye vvî Elî, li herî peşiye bû. Düe wî girme girm bû. Dbcvvast ku lexe, bişkene. Diranen xwe diriciqand. Leven wî diricifiyan. Tahir bedeng, ker û lal, le düe wî tijî kul bû. Heyfa diranen xwenen şikestî dihanî bî ra xwe. Toz li pey vvan quloz dibû.
Re hiştin û bere xwe dane hevraz. Ber bi jor. Kûr, kûr bîhn distandin. Jina Ûsiv axa, berî giştan evv dîtin. Di riya Zîlanede qelebalixa vvan, bi dar û çove diçûn. Evv dîtin. Te digot ku ji düe vve tiştek qetiya. Bû girpîna dile vve. Spîçüokî bû, di pey vvan niherî.
Maruf... Maruf... Gundî bi daranve, di riya Zîlanedene. Li wî ya lî diçin. Diçine zeviye. Diçine cem bave te. Dîsa, kî çi zane vve çi xeletiye bikin? Çi gûyî bbcvvin? We belake giran denrin.
Bûk, zar û meriyen male gişt, derketin der û meze kirin.
Way bavo. VVay bavo. Tu dibejî ku diçine şer, got büke.
Marufji qelebalixere çer dikirin. Bilde buda zimane wî bû. Kesî ti ştek ji dev fem nedikir. Doxtiran gotibûn ku bira hers nebe, li ber xwe nekeve.
299
VVaye, vvaye... Ev cine, tene sere me? Tu van karen bave xwe di bînî? Van kuçiken har tiştekî neynine sere me?
Jina Ûsiv axa xwe şaş kir. Kete derde mere xwe. Revî û kete hun dir. Maruf û bûk li pey çûn. Maruf mile xwe kire bin ister. Tiving li vir veşartibû. Li vve digeriya.
Diya te qurbana te. We berde. Kirineke ji deste te derkeve. Ber de vve.

Maruf dbcvvast xeber bide, her diçû perişan dibû û pe nedihat. Di ya xwe dehfand, xwe rikefî tivinge kir.
Bihele... Çi gûyî dbcvvin bira bbcvvin. Çûne traktöre. Evve dîsa xwe xüas bike. Xwe xüas neke jî, tiştek nabe. Bave te siyare, tiştek bi wî jî naye.
Xwe avete çöken küre xwe. Girya. Küre vve gavek jî nehavet. Bi du destan, çîpen küre xwe hemez kiribû. Bûka vve hate ale. Maruf pir diqehirî.
Kef dora deve wî ket. Desten wî diricifiyan. Şûnve çû.
Dîsa derketine derve û le niherîn. Nedihatine xuyane edî. Mala vvan hinekî di kortede bû, li bintara gund. Riya Zîlane, hetanî Kaniya Gurriya tene dihate xuyane. Gerek li mal jî serwaxt û hişyar buna. Te ni herî ku vegeriyan û hatine vir. Jinan evv, bi zor û zehmet birine hun dir. Xulam, virde û vvede çûn, hatin. Le nedbcvvastin ku tiştekî bikin. Zaren piçûk, xwe telandine li der doran. Çend pismamen vvan hatibû ne male. Be qerar û bedeng, li ser piyan disekinîn. Nedbcvvastin ku vvilo destevala li vir bin. Le tu tişt ji desten kesî nedihat. Diçûne der û dihatin. Derketine ser xanî, niherîn. Jin û zaren gundiyan jî li ser xaniyan meze dikirin. Li ale Zîlane diniherîn.
Şofer li ser traktöre, di kare xwede bû. Hevv hinerî ku Ûsiv axa li ser hespe kumeyt, hatiye cem.
Oavvetbe.
Tu saxbî axa. Xwede ji te razîbe.
Çüo diçe? Bi zehmete an na?
Gelekî baş diçe. Erde vir nerme. Be kevire. Hetanî evare digihejime tûmî hane, got. Bi tilya xwe tûmike li jer nîşan da.
Te rind li hidûde Zîlane binheriya. Tu zanî...
Qet tu ber nekeve axa. Gavek ne zede ne jî kem.

Şofer traktör dajot, Ûsiv axa jî bere hespe xwe berve hembere Zî lane kir. Rind hatibû ajotine. Ji vvir, çû sere zeviye jorîn. Di nav zevi yan, merjarken hişk bûyin meze kir. Çend zevî ku bi hevre dihatine ajotine, edî evvjî nediman. Xwast dîsa be cem şofer. Sere hespe vegerand.
Nezîkî traktöre bû. Re, di bintara zeviyere derbas dibû. Di rede
300
qelebalix dît. Di desten vvande dar, şiv... Deng û qîrîn bihîst. Traktör bi berve wî dihat. Pişta şofer bi gundiyande bû, hatina vvan nedidît. Ûsiv axa nişkeve veciniqî.
Even ku tene, kine?
Şofer traktör da sekinandine. Gundiyen ku tene, dît.
Gundiyen mene axa. Dîsa hatin.
Nava vvande pencsed metro, anjî hinekî zedetir hebû niha. Ûsiv axa her tim debance bi xwere digerand. Le pişti kopbûna tiliyen vvî, rind pe kar nedikir. Gülle kire deve debance û debanca tezî avete berîka xwe.
Çi dbcvvazin? Niha vve çüo bibe?
Axa, dev ji debance berde. Li cem vvan jî heye. Be şik. Tu serî pe nakî. Tu nesekine, bireve. Bira tiştek bi te neye.
Çilo? Çilo? Ez birevim, te got?
Hespe gema deve xwe dbcvvar, di binde nedisekinî. Qîjîniya gundi yan her nezik dibû. Meriya dengen vvan, ji hev ferq dikir. Ûsiv axa he la he be qerar bû.
Ez çilo ji peş van benamûsan birevim?
Le te çi bikî? Xenji reve, xüasbûn tüne. Zû bike, zû. Tu ku de reng bimînî, edî be feydeye.
Ûsiv axa bi înad sere xwe ba kir. Gundiyan dît ku Ûsiv axa li ser

hespe, li ba traktoreye. Her lez dikirin. Çend xorten nevvestiyayî, him didane çeran, himjîji erde kevir berev dikirin. Bi rev nezî traktöre di bûn. Niha di nava vvande, se sed metro ya hebû, ya tunebû.
Yekî ban kir:
Hinek ji vve, bin tare bigrin. Bira nereve. Berve jor, çend kes bi minre vverin.
Oelebalbce xwe berda hember û fireh bûn. Yen pirîn xwe dane je re. Hinek jîjorve diçûn. Di nava vvande giraniya gundiya, berve trak töre dihat. Bi tevayî nezîkî sed kesî dihatine xuyane. Şofer:
Tu çi disekinî axa? Tu naniherî ku hevvar dora me digrin. Nese kine. Nesekine. We te bikujin.
«We bikujin». Ev pirsa hela he di deve şoferde bû ku Ûsiv axa hes pe xwe serejer zengû kir. Hesp ji qelebalbce xûlîbû. Ji pare kevir û dar dihavetine.
Min deve peşiyen te no. Min de û jina te no.
Nereve kûçiksan. Çi mîna jinan direvî?
Nîve vve qelebalbce berjer bûn, çûne ser re. Re birrîn. Axa, şûnve revî, paşe ji bin tara re, xwe havete çayiran û çar gavî bezand hesp.
301
Axa ji vvan pir dûr, ana nezî gund bû. Jin û zaren gund kevir tijî peş û benken xwe dikirin û hatine ser riya gund. Axa ku nezîk bû, dest bi keviran kirin. Mînanî barane zîpike. Ûsiv axa bi zehmet xwe diparast. Ve çare xwe da binya zeviya dibistane ku kevir lebûn. Gihîşte riya ba jer. Dûr ket. Çend zar li pey direviyan. Kevir havetin. Le axa pir dûr bû edî. Zaren axe le kirin ku herine alîkariye, paşe dîtin ku naye girti ne, devjeberdan.
Hinekji gundiyan di pey axe revîn û kevir avetine. Paşe zivirîn. Bîh na vvan hatibû çikandine û hilke hilka vvan bû. Yen ku çûne feza zevi

ye, dîtin ku axa revî, di nav toz û xwîhede serejer hatin. Nezîkî traktö re bûn. Di nav evv kesen diçûn, Soro û Mîro jî hebûn. Şofer li dora xwe niherî. Ciye reve tunebû. Nişkeve tirsiya. Paşe xwe berev kir hinekî. Yen ku jorve dihatin pir nezîk bûn û didane xeberan. Ceren nebihîstî dikirin.
Lavvo. Kûçike küre kûçika. Te ve çare kude birevî? Te niha bi bînî.
Ez diya te jî diya axe te jî...
Çend kesan kevir dihavetin, pere, pere. Traktör dabû sekinandine û mifte kiribû berîka xwe. Rûye wî di nav tozede û ber tave şevvitiye. Kiras û şale wî nav rûn û qirejedene. Desten wî mezin û qelişîne. Xwe ji keviran diparast. Du gav peşde çû. Soro û hevalen wî he pare, pencî metro dûrin. Her alî, je hatibû birrîne. Rast digotin, ve çare xüasbûna vvî zehmet bû. Evv bedena mezin, nikaribû tirsa xwe veşere. Di le wî dbdste girme girm. Penc, şeş kes li peş, le bûn ku li wî xin. Bisekinin. Cima hûn dîn bûne? Hûn ji min çi dbcvvazin? Pirsen vvî di deve vvîde man. Ku xwe nehavîtiba ale dine, dare hatî, vve sere vvî pirtî pirtî bikira. Denge Soro yî bilind nehişt ku dare duda û sisya lekeve.
Bisekinin... Bisekinin. Le nexin.
Soro, çoye wî di destde, li peşiye direviya. Yen dora şofer, vvekî tey ren birci, vvekî güren cila... Li ser denge Soro vekişiyan. Le dîsa jî di dane xeberan. Ceren nemayî dikirin. Şofer ji bereve bi Soro bavver di kir. Wexta ku Soro dît, dile wî rehet bû. Ruh hate ber. Le evven cem? Daren deste vvan, çaven vvanen xayîn? Şofer xwe li ber mirine didît. Niha gişt li havvîrdora traktöre bûn. Yek, vvekî dîna diqehiriya û diqîriya. Hûn çi sekinîne? Cima traktöre naşevvitînin?
Tu, cara dine xüas bûyî. Kûçiksan. Be şîro. Te ve çare çi bikî?

Soro herdu desten xwe bilind kir. Kesîşofer nexist û dest neda trak töre.
Bisekinin. Hela bisekinin.
Dengen ne baş dihatine guhe şofer. Yen pare mayî, yen peşiye didehfandin.
Hûn çi rûye wî diniherîn? Cima deve vvî, bela belayî nakin?
Şofer xîret kir. Le tûk deve vvîde zuhabû. Nikaribû xeber bide. Des te xwe da ser tekera traktöre. Rûyen, yen li dora xwe meze kir. Hemû vvekî jehre tûj bûn.
Ez vve nas dikim. Hûn ne dîn û ne jî semene. Hûn çi ji min dbc vvazin?
Kesî deng ne kir. Evv guhdarî dikirin. Ji pare dengek hat:
Zede xeber nede. Tu li vira çi digerî? Sere me dbâ belaye.
Neqehirin. Çend pirsen min hene, ji vvere. Hersa xwe neynin. Ci ma ez bi dü û kefa xwe li virame?
Denge wî düerizî. Peş çaven wî reş dibûn. Gej dibû. Jin û zaren vvî hatine peş çavan. Niha rehet û bi hemde xwe bû, hedî hedî. Dikaribû bi düe xwe bipeyive. Hertim, ke tiştek je dipirsiya vve çaxe bersîv di da. Niha dbcvvest ku bi vvanre qise bike.
Cima min jî nedbcvvest? Di ba jin û zaren xwe, tasek girar, bi te vayî bbcvvim? Hela hûn dest, pî û kincen min meze bikin. Ev tu hale meriyane. Ne vvisane? Gelo cima ez ve kûçelane dikişinim? Ez jî vve kî vve birçîme, feqîrim. Levvra. Piştî van salan, min namus, jin û zaren xwe, di nava xelqede hiştine, hatime vira. Ye ku distînim, tene tera zi ke me dike. Li bin tave, berbanga sibe hetanî tariya şeve. Caran şeve jî kar dikim. Hela ji minre bejin. Cima kî pîjan di minre dike ku ez vvilo kar dikim? Ne deste mindeye. Küre xelqe ku peran bide, meriya

avvha dide xebate. Ferqa min û vve çiye? Ere? Ez jî yekî vvekî vveme. Birayekîvveme. Hûn cima ji minre dijminatiye dikin? Wekîdijminatiya birane ev. Hûn şaş difýkirin, tene bela xwe di min didin. Çi sûc û gunehe min heye? Ez derd û kulen vve fem dikim. Ez awqasî ne be femim.
Dile min jî dişevvite. Ez jî merivim. Le çi ji deste min te?
Yekî pirsa wî biri.
Wexta dile te bi me dişevvite, tu li vir çi digerî? Cima alî Ûsiv axa dikî?
Li ser ve gotine, yekî din jî ban kir.
Raste. Rast dibeje. Tu cima hatî vir, vvekî vvisane?
Ez ku nehatama, yekî dine vve bihata. Şoforen vvekî min, karekî dine nekin, jin û zar heviya perçek nanbin, vve bene. Ha ez hatime ha 303
yekî dine. Çi ferq heye? îca, ez nehatama, mine çi bikira? Ere? Ezbirçî bimam? Hûn he zanin ku vve şofer nedîta Ûsiv axa. Ev gotinen vve şasin. Birano.
Dîsa yekî din deng kir:
Em naxwazim qet, biratiya mînanî biratiya te. Bira qe nebe.
Soro nedbcvvast ku tiştekî nece û be tam bibe. Levvra nehişt, kes ze de here.
Bisekinin... Bisekinin... Hela denge xwe bibirin qaseke. Neqehirî bipeyivin. Ke dest daye ser erde me?
Ûsiv axa.
E. VVekî vvüoye. Tu ev feqîre xwede, zeviyen vve ji desten vve girtiye?
Evv jîji bo keda xwe, Ûsiv axare dbcebite. Erde wî tüne. Nexwendiye.
Evv jî, xwere şoferî hîn bûye. Ji bo xatire me, bira nan nexwe?
Ere? Evv jî di hale medeye. Heke ku kar neke, evv jî birciye. Nexweş bikeve dîsa birciye. Di bin deste xelqedeye. Çi vvîre, zeviyen me di

mehkemedene. Zevî kinin an direjin... Bajo dibejin, evvjî dajo. Çi sû ce wî heye? Nane xwe vvilo bi dest dbce. Ez jî wisa bavver dikim ku ne dijmine meye. Ji bo çi, mere dijminiye bike? Me çi kiriye?
Yek, dudu di ber xwede xeber didan. Mîro dengen vvan biri.
Kerrbin. Hevale xwe guhdarî bikin. Çi xeber didin di nav xwede?
Hersa giştan kem bû. Yen der doran jî hatin. Oelebalbc zede bû. Ji çav, rûyen vvana wisa dihate xuyane ku heq didane van gotinan. Evv niherandinen
bi dijminayî, li ser şofer, hedî hedî belabûn. Hinekan bi
dostî meze dikirin û gunehe vvan pe dihat.
Şofer hela he dibcemgîn û bi çav kelogirî bû. Dît ku evv xeber nadin, dîsa dest pe kir.
Niha ji minre bejin. We dbcvvast ku li min xin. Traktöre jî bişe vvitînin. Cima? Em herdu jîji axere xizmet dikin, levvra. Ne vvisane? Çi gunehe min heye? Bira traktör ya vve biya. Pere vve hebûya. We çaxe mine bihata, ji vvere kar bikira. Nane min ji vir te. Hûnji traktöre jî diqehirin. Yen ku ev traktora çekirine, gotine bira zûtire û kûr erde bajo. Bira zevîji bere pirtir bidin. tu kesî nefikiriye ku bira ev trakto ra here, erde tendurekiyan ji desten vvan bigre. Ku ji vvere kar kir, er de vve ajot, vve çaxe kara traktöre vve bigiheje vve. Ne vvisane? Tu sû ce traktöre jî tüne. Sûc û guneh di cîkî dinedeye. Hûn li zeviyan nebû ne xwayî. Axa dest daye ser. Heke ku, zevî ne di deste Ûsiv axade, di deste vvede buna, çi kare min hebû li vir? Eze ji vvere bbcebitîma. We çaxe vve bi minre dijîtî nedikir. We traktör nedişikenand. Weye ji vve hez bikira.
304
Denge wî ket. Bîhna wî çikiya. Soro peşde çû. Deste xwe da ser pi le vvî.

Min bibaxşîne bira. Meji Ûsiv axa pir kişand. Levvra em baş nefikirîn. Hinek hevalen me şaş xeber dan. Tu jî nexeyide. Te dît ku ev du şalin çi nehate sere me? Levvra ji bo te vvüo hate gotine. Tu jî bira ye meyî. Ne dijmine me. Tu jî, ji axere kar dikî. Kînge bbcvvaze, dika re re bide te. Tüye ji me jî betir perişanbî.
Ûsiv axa ji desten vvan filitî û xüas bû. Xwastin ku heyfa xwe ji şofer û traktör bildin. Niha, destevala mabûn. Her vvekî ku tiştek te bîra me riya. Tiştekî ku meriya ji bîr kiriye. vVe çi bikirana?
Gerek Ûsiv axa ji gund derkeve. Ciye vvî, edî ü Tendureke tüne.
De zû... Eme heta kînge li vira çîrokan guhdarî bikin?
Hela bisekinin. Weji dest dendst, Ûsiv axa. Mala vvî, jin û zaren vvî, bar bikin, ji gund denrin. Diçine ku bira herin. Evvî tu ji me dipirsî ku eme herine ku... Ciye vve yen çûyine hene an na.
Raste. Rast dibeje Seîd. Em vegerine gund. Aha, traktora vvî.
Eme, mala wî tekine traktöre û ji gund dûr bbrin.
Ere vvalle. Pardon ji tere Seîd. Ya rastî eve.
Hûn heviya cine niha?
De ha. Tekevine re.
Hinekji vvan, serejer, berve re çûn. Soro û Mîro tiştek negotin. Gun dî bi tevayî û bi qerar bûn.
Heke ku Ûsiv axa li vir buya, ji bo xüaskirina cane xwe, vve qebûl bikira. Le bele evv reviya. Bi çar gavî hespe xwe ajotibû. Wisa dbcuya ku çûye bajer. Çûye ba cendirme qumandarî. Di serîde derd û kul, vve dest pe bikin. Mal û jina Ûsiv axa, Maruf û yen dine hatine bîre. Eve çi bibûna? Le vvekî, gundî dîntîke, be aqiltîke bikin? We çavva peşiya vvan bigirta? Le ku, bûyereke pir xirab ji desten vvan derketa? Piraniya gundiyan edî bi rede, berve gund diçûn. Soro her tişt ji şoferre got. Tu gundiyan dibînî. Ditirsim ku xirabiye bikin. Mala Ûsiv axa...

Alî me bike? Eme çi tehrî peşiya nepakiye bigrin? Gerek mala Ûsiv axa bîr û bavver bike. Bira bihelin herin. Ji vir ha, di gundde, cîrantî û bi hevre baş reçûyin nabe. Gelek zahmete. De zû bajo. Lez bike. He re mal. Her tiştî ji vvanre beje. Bipeyive. Eze jî bigihîjime gundiyan, ji pare beme. Zû... Zû. Alî me bike. De tu biraye min kiribî.
Şofer mifte ji berîka xwe derxist û motor bi re xist. MUle pûlbce bi lind kir û ji motore qetand. Paşe ku cem gundiyanre derbas dibû: Soro dibeje ku bira li heviya min bisekinin. Bira necin, heta ez tem. We bi vvere bipeyive.
305
Dbcvvast kü zûtire here. Waxta ku gihişte ber dere male, Maruf de ûjina wî û yen .dine, li ber derî, bi meraq li benda şofer bûn. Gundî he li dûr bûn. Meraq dikirin ku şofer çavva ji desten vvan filitîbû. Li ser xaniyan, li ber deriyan jin, zaren gund li riya Züane diniherîn. Hemû yan li rûye şofer meze dikirin. Gelo çavva xüas bû? Je pirsin. VVî:
Çi tehrî xüasbûna min biheline alîkî. Tene vir. Min traktör xüas kir. Lava kir. Hezar tişt ji vvanre got. Dile vvan bi min şevvitî. Gunehe vvan hat. Ten. Dbcvvazin ku vve bi maltî, tevayî, ji gund denrin. Nebe, nebe hûn li dij derkevin. We vve perişan bikin. Xere di malede nane lin. Min evv dîtin, çüone. Xwede nîşanî kesî nede.
Jina Ûsiv axa:
Ev çiye tu dibejî? Tu dînî, semeyî? Eme mala xwe bihelin, herin ku? Ya ku anîne sere küre min, ne besî vvane? Qet fedî nakin? Way be namûsen be namus.
Şofer vegeriya li Maruf meze kir. Evvî, bi zehmet, xwast ku xeber bide.
Na... Na... Nabe, got.
Xanim, vvare neke. Neke ve yeke. Nava vve wisa xirab bûye ku...

Kes kesî guhdarî nake. Ez çavva xüas bûm? Çer filitîm? Bi zehmete di ne. Yekî darek hanî sere min. We mejiye min birijanda erde. Xwede ez xüas kirim. Paşe ku vve niherî hine zelalî çebû, hûne dîsa bene. Ni ha male û xwe biparezin.
Ûsiv axa... Le Ûsiv axa, vve ji mere çi beje? We me giştan şerjeke. Tu çavva wisa dibejî?
Vegeriyan, niherîn. Oelebalbc di nav töze, ji yale Zîlane dihat. Ji sûr û baxçe vvan vvede. Şofer dît ku gundî her nezîk dibin, careke din jî ceriband.
Le nebû. Kesî qebûl nedikir.
Bi nezîkbûna gundiyan, tirs û xof kete dile hemûyan. Maruf çû hun dir ku tivinge bîne. Diya wî û şofer bi mile wî girtin û nehîştin.
Lavve min. Yen ku hatine sere me, ne besî mene? Bihele vve mîrate. Xirabî bira ji deste te dernekeve. Debanca te di berîka tedeye.
Ez qurban, dest bi vve jî mede. Bi girî:
Dest mede. Şîre xwe li te helal nakim, heke ku tu tiştekî bikî.
Oelebalbc bû du çîqa. Yen pirîn, di riya bin baxçere dihatin. Hinek jî, feza baxçere. Qaseke şûnde, vve li ber derî buna. Jin, zaren li ser xanî û ber deriyan jî hedî hedî berve mala axe dihatin. Dora male niha dihate girtine. Wekî defýkeke.
Jinen mala axe, zaren xwe birine hundir. Zar digiriyan ûji tirsa xwe dispartine hevdu. Ji mezinan nediqetiyan. Jin jî vvekî zaran bûn. Ma-
306
rûf, xulam û pismamen wî li cem, li ber derî bû. Oelebalbc bi deng û hela hela pir nezîkî malene niha. Şofer berve vvan çû û. deste xwe bi lind kir:
Deqîqeke... Hela qaseke bisekinin. Min guhdarî bikin.
Evv kesen ku bi hers dihatin, sekinîn. Soro û Mîro jî di nav vvande

bûn.
Çiye? Eme cima bisekinin? got yekî.
Soro bersiva wî da.
Hela bisekinin. Çiye? Çi dibeje merik?
We çaxe kevirekî mezin hat li pencera ode, ya ale baxçe ket. Bûşingîhiya şûşen şikestî. Mîro bi qehr û dengekî bilind:
Wisa mekin. Wisa mekin.
Denge xwe birîn. Maruf hundirqetî bû. Ji nişkeve awqas meriv li peş. Gişt jî bi qehr û kîn. Nedikaribû peşde here, ne jî şûnve here ma le. Dile wî nedbcvvast ku tirsa xwe, bi vvan nîşan bide û tekeve male. Qîre qîra vvan bûn. Didane çera. Pirsen nepak digotin.
Şofer rast digot gava dine. Bele, ve gave, van kesen çavsor dikarin her tiştî bikin. Dîntiya ku nekin tüne. Şaşiyek, pirseke nece besî her ti ştî bû. Bi çaven xwe dît. Soro û Mîro nebûna, ana zûve mal hüşandibûn.
Şofer nezî Soro bû û bi dengekî nizm:
Nebû. Bavver nakin. De û kur bi hevre ketine inyate. Oebûl na kin.
E. Eme çavva bikin niha?
Nizanim.
Yen peşiye hinek tişt fem dikirin. Soro bi ale vvande zivirî:
Ez diçime hundir. Nebe, nebe yek tiştekî xirab bike. Xwede za ne ku berî giştan eze li dijîvvanbim. Serme, eybe. Wekîpexasan, vvekî tolazan nekin. Di nava dinede xwe rezîl nekin.
Soro, Mîro jî hilda ba xwe û bi şoferve çûne male. Pânzde metro peşde çûn. Hatine peş Maruf. Maruf vvekî dînan bû. Ve qelebalbce evv kiribû vî halî. Le dît ku ne wexta dînitiyeye. Bi aqü bi hemde xwe, li yen hatî diniherî.
Bibaxşîne Maruf. Were em li hevvşe xeber bidin. Çend pirsen

min hene, ez ji tere bejim.
Kin, kurt digot. Wekî ku emir dida. Wekî emiren ne wisa tûj. Ma ruf gura wî dikir. Şûnve çûne hevvşe. Xulam û pismamen wî çûne ale male.
Binher Maruf. Ez gelekî ber xwe ketim... Ji vanen bûyî. Gişt jî be dil bûn. Le ev du şalin ku bave te xwîn ji befila me gundiyan tîne.
307
Cîrantî, merivtî û revvş nema li gund. Dostî nema. Dijmintî hate devvse. Ûsiv axa vvüo kir. Tu dibînî. Qet yek ji me, nikare peşiye bigre. Ez lava dikim, li ber te diðerim. Bira nepakî çenebe. Naxwazim...
We çaxe diya wî jî hate cem vvan.
Soro, min he zanibû ku tu bi aqü û bi namûsî. Tu jî tevî van berdûşan, van tolazan bûyî? We derî li me girtiye. Hûn ji me çi dbcvvazin?
Maruf nikaribû xeber bide. Guhdarî dikir. Soro li diya wî zivirî û got:
Neqîre. Neqîre vvisa. Bi hemde xwe xeber bide. Ev pirsan ne yen gotinene. Tu ji min mezintirî û jinî. Devvsa diya minî. Ji tere hürmet dikim, le bele, awqasî jî peşde nece.
De bira vvisabe. Bele, bele. Hûn çi dbcvvazin?
Ez naxwazim. Ez tiştekî naxwazim. Gundî hemû, dbcvvazin ku hûnji gund deren. Dibejin ku zeviyen meji desten me girtin. Gund vala kirin. Dijmintî kete nava me. Em edî nayene ba hev. Ji vir ha, qet qet nabe. Levvra tu vvere, bi pakî ve qebûl bike. Li dij nesekine. Tu û Marufvvekî Ûsiv axa nekin. Beşe. Yen bûyî beşe edî. Min cara dine jî Maruf neparast, ere? Te bi çaven xwe nedît? Mere te her tişt havete hustiye min. Aha, le binhere. Ev neynûka mine kişandiye. Dîsa jî ez naxwazim ku xirabî derkeve. Te li ber derî, hemû dîtin. Mal, milke vve heye. Hûne li bajer, ji vir xweştir bijîn. Hers û qehra gundiyan ku der

bas bû, vverin li zeviyen xwe bibine xweyî. Dbcvvazin bifroşin, dbcvvazin bidine îcar.
Li ser van pirsan jina axe piçekî nerm bû. Paşe Ûsiv axa hate bîre.
We evv bikuta, bikuşta. We wisa bikira ku nedihate sere tu kesî.
Tobe, tobe. Eze çavva mala xwe bihelim, herim? Hûn rebirin?
Hûn cine? Hûn qet ji hukumate natirsin? Ûsiv axa vve me hemûyan bikuje.
Soro rind zanibû ku tirsa vve ji mere vveye.
Em ne rebirin. Ne jî dizin. Ne jî li ser male xelqede digrin. Te dît ku ev du şalin, em çi dikşînin? Tu qet rojeke nezivirî û te ji mere xwere negot ku ve neheqiye meke. Ev pirsen ku ji mere dibejî, cima te qet nîve nîve vvan jî, ji Ûsiv axare negot? Cima emjî ne meriv bûn? Me awqas sal cîrantî bi hevre nekiribû? Pore te sipiye. Ji tere hürmete di kim. Tu çavva ji mere eşqiya, rebir dibejî? Tu qet ji xwede natirsî? Ez hatim ku vve biparezim. Bira nepakî çenebe. Li te lava dikim. Wisa ne ke. Berde ve inade. Nekeve gunehe awqas kesî. Nekeve bin gunehe zaran.
308
Çend gav peşde çû. Xwast ku yen peş xanî, bi Maruf û diya wî nîşan bide. Dibe ku bene re. Hela he ve qasede bû ku denge gundiyan hate guhe vvî.
De zû, lo. Çi bû Soro? Beşe edî.
Van dengan teri hişyarbûna Maruf û de nebûn. Soro:
Werin... Hela vverin. Ji vir bibinin. Ez li vir, ne li ba vvebim, hû ne bibinin çi dibe. Nasekinin... Cima hûn nabînin? Hûn korin cima?
De û kur bi meraq, di deve deride, li der meze kirin. Panzde, bîst gav ji vvan dûr, qelebalix bi hers û qehr û desten vvan tijî dar û ço bûn. Bi tirs û ricaf xwe şûnve kişandin. Maruf vvekî gej û seman bû. Soro û

diya xwe guhdarî dikir û beqerar li dora xwe diniherî. Qehr û berketin jere ne rind bû. De li rûye wî meze kir. Dît ku hale wî ne başe. Birabe. Bira vvisabe. Xwede ji vvere qebûl neke. Bira bi gotina vvebe.

Kete mile küre xwe û çû ode. Li ser balîfekî da rûniştandine. Ma ruf bedeng gura diya xwe dikir. Diya wî bi girî çû yale male, ba büke û zaran.

Xulaman niha nivîn kom dikirin û li hev dipeçandin. Qutî û tişten giranbiha yek û yek li peş xanî rez kirin. Eyaren rûn û pener. Çiqas ti şten giranbiha hene dbcvvastin ku bi xwere bibin, hetanî ku ji desten vvan dihat. Yen mayî, vve tekirina odan û derî li ser mifte bikirana. Soro û Mîro pirs dane vvan ku tu tişt bi mala vvan nabe. Evven le bi bine xwayî. Şofer yek û yek, tişten male li romorke cî dikir. Gundî, ji ciyen xwe nedilipitîn. Rûyen vvan şa, çaven hemûyan dibiriqîn. Ku evv tişten giranbiha diniherîn, diziviriyan di nav xwede qise dikirin. Jin û zaren gund hatine jere, ber goma Ûsiv axa. Xulam û jinan mal dikişandine romorke. Deve kesî vcnedibû. Xeber nedidan. Te gülle jî berdaye, xwîn ji kesî nediqutî, nedihat. Römork tijî bû.

Jin û zar di nav nivînande dane rûniştandine. Maruf te digot ku di xewede diðere. Qet haya wî ji kesî tüne, li dora xwe meze dike. Wekî makîneke. Te digot ku be ruhe. Kîçi dibeje, Maruf vvüo dike. Nabeje na. Niha, hemû digiriyan. Heta niha piçekî tamîş bûn. hesiren xwe gir tin. Le edî pe nikaribûn. Bi deng û qîrîn digiriyan. Evv gundiyen ku ga va dine şa û bi rûken li vvan meze dikirin, ne wisa bûn niha. Dile vvan jîkizirî. Giriye mala axe evvşa nedikirin.

Jina Ûsiv axa teme dane xulaman û evv şîret kirin. We zûtire biha tana ji bo tişten mayî. Wisa be serîxwe nedihiştin. Hela ka Ûsiv axa çi dibeje? Hilkişiya ser romorke, cem bûka xwe û:

Xvvede qebûl neke. Xvvede ve ji vvere nchele, got.
309
Him digiriya û him jî bi leçega sere xwe çaven xwe zuha dikir.
Be dengi... Wekî maleke ku mirîtedebe. Dengen yek, düden ku di giriyan tene. Şofer xwast ku zûtire ji vir dûrkeve. Vegeriya ale Soro û Mîro niherî. Gelo çi dbcvvast ku ji vvanre beje, bi çavan? Lez kir... Motor li kûça pist gome, bere xwe da riya bajer. Wî hevrazîde toz li pey bilind dibû. Wekî evvren payize. Toza vvan jî bi vvanre diçû. Li pey çûyina motore, gundî hatin ber dere Ûsiv axa, ji vvir berve nava gund bûn. Meriya nizanibû ku şa dibûn an ber xwe diketin, ji rûyen vvan nedihate kifşe. Şabûn... Le şabûneke ne bi dilgermî. Di alîkîde şabûneke be tem. Meriven ku duşa dibin, tu vvehane? Rûyen vvan bi ken, tîrj nedidan. Meriven ku him kare û him zerare bikin. Wüo bûn. Giriyen jina, hustuxwarbûna zaran... EvvMarûfe vvekî kireca cemidî. Li tendurekiyan hemûyan xweş nedihat. Mal li heviya xulaman hiştîbûn. Rojeke bere, evv mala mezin, bi dû û ocax. Di nav çend saetande vemirî. Çû... Çû... Hemû dilşevvitî bûn. Nedbcvvastin ku ocaxe yekî, mala yekî damire. Tûr û tepez bibe. Le di ale dinede, ji Ûsiv axa xüas bûbûn. Pariye deven vvan jî, ji deste vvan digirt. Le bû ku çaven vvan derxe. Çavva şa nebin? Di xewna xwede bidîtina, dîsa jî bavver nediki rin. Ûsiv axa ku qebûl bikira, evv bi her tiştî razîbûn. Le axa nedihate re û nedbcvvast. Niha edî Ûsiv axa tunebû. Ji vir ha, vve bi xwe, sere xwe buna. We rehet bibûna. Bi salan hesreta ve roje kişandibûn. Li van herdu salen davviye, her betir. Berve malen xwe diçûn. Dil û hişen vvan tijî û giran bûn. Di dile xwede digotin ku «hela he neqedyaye.» Wisa jî bû. Soro ji yen dora xwere:
Ûsiv axa li bajere. Heke ku qaseke şûnde, cendirman tijî gund neke, rinde. Dibe ku koça mala xwe di rede, şûnve vegerîne. Levvra,

vvisa xwe bernedin. Bi tivdarekbin. Bela xwe bi cendirman nedin. Li dijî vvan dernekevin. Ku wisa nebû, em çûn. Kes nikare me xüas bike. Evvli mexinjî, ji mere bidine çeranjî... Pirsen nemayîji mere bejin jî, em bersive gere nedin îro. Ûsiv axa bizanibe ku ve çare kare wî zeh mete, cü bi giranbihaye... Evv jî nasekine. Di davviyede evve jî here. Bi ra fem bike ku li vir meranî nabe. Evv besî vviye.
Xortekî:
Hetanî evvjî nekeve hale küre xwe, naye re. Baqü nabe. Kopbûna tiliye, tera wî nekir. Gerek dev û poze wî biçûya. Te vve çaxe bidî ta, got.
Mîro li ale çend xortan zivirî û:
Dîn nebin. Dev û poz şikenandin ne kare. Bira xwîna wî nekeve hustiye me. Bira nebe bela sere me. Derde me evve ku em wî ji gund
310
denrin. We ku deste xwe bi xwîne xist, edî hûn nikarin bişon. Semetiye, be aqüiye nekin. Eman... Eman...
Soro sere xwe pere hejarid. Kete nav pirsa vvî.
Heta niha, heta vir, hela he baş diçe. Şaşîû xeletîk her tiştî şûn ve dizivirîne. Eman ha. Xortno, ji vvere dibejim. Gura mezinan bikin. Berî vvan tevî tu tiştî nebin. Nesitiriye nekin. Hişyarbin. Ye zehmet û direj çû. Pir nema edî. Le şasiye û xeletiye qet qebûl nake. Ûsiv axa bi cendirmanve, nava du saetande, vve be. Ya xer evve ku Ûsiv axa bitirse û şûnve neye. Mala xwe şûnve venegerîne. Hema ku careke çû, edî şûnve hatina wî li gund, ne hesaye.
Gundî li malen xwe bûn. Saetek, dudu derbas nebûbû, hela. Deng dihatin.
Li ber dere mala axe jîpek sekinî. Cendirme, Ûsiv axa û qumandar je peyabûn.

Ve çare evv nermbûna vve sibehe tunebû. Dile kesî nedişevvitî edî.
Ji hemû malan qelebalix derketin. Tirsa cendirman, qumandar û şûn
ve hatina axe hate ber çaven gişta. Serejer, berve mala axe çûn.
Ûsiv axa li ber dere xwe, him berve vvan dihat û him jî de û jin dida
xeberan. Ceren ji doxîne jerve dikir. Oumandar û çar cendirme nezî
vvî bûn. Ji xulaman tiştin pirsî axe.. Ûsiv axa vvekî dînan bû. Çi dihate
ber deve wî digot. Reş heşîn û kef bi dora deve wî diket. Pesîra kirase
vvî vekirî û sînge vviyî bi pirç li derve bû. Ceren vvî, gundî aciz kirin.
Her betir hers dibûn û diqehirîn.
Soro mecal nedît ku ji kesîre tiştekî beje. Hinekan kevir havetine
Ûsiv axa. Evvî him xwe diparast û himjî dida xeberan. Çend kesan xwe
pere gîhandin, şivek, dudu lexistin. Paşe dev û serî bi tevî hev bûn. Ou
mandar jî şaş bû. Qet.texmîn nedikir. Her tişt ji nişkeve bû.
Soro ji ye peşînre diqîriya:
Lavvo, hûne merik bikujin. Le mexin.
Ûsiv axa ber bi erebe reviya. Yekî ji pare, darek le vvar kir. Leneket.
Dere male nişkeve tevî hev bû. Jin û mer bi hevre. Qîrînî bilind
dibû. Kesî kes ncdibihîst. Denge gullan dest pe kir. Jin bi teqîniya gullanrc
qîryan.
Way xwede mala vve vemirîne. Xwcde ji vvere nehele. Gullan
bcrdidine. Waye... Waye... Gullan berdidine.
Dîtîn ku gullan berî ezmana, berî hevva didin, hinekî nerm bûn.
Denge xwe kem û nizm kirin.
Cendirman, tendûrekî ji qcreqole nas dikirin. Oumandar ji vvan
xwast ku gundiyan bi singû û qûntara tivinga dûncin. Oelebalbce bela
311
bikin. Le cendirma deste xwe wisa sivik negirtin. Li kesî nexistin. Tivinge
xwe bilind dikirin û dihanîn ku lexin. Le ne bi dil. Te digot ku

köze bene berdane nav keriye miyan. Heke ku cendirman wisa nekirana, çend kesen birîndar û bûyeren ne baş vve bibûna.
Oumandar dît ku Ûsiv axa revî û xwe havete jîpe. Xeter nemabû edî. Şewqe wî li nav piyade ma û serî wî şikestibû. Leva Ûsiv axa jî qelişîbû. Xwe havete pist şofer. Bîhna wî çikiyabû.
We min bikujin, We min bikujin... Eman, lavve min zû bajo. Min ji vir xüas bike.
Şofer jîp da ber kar kirine. Bi lez peşde ajot. Ji gundiyan yek dudu xwe bi zehmet ji peş jîpe xüas kirin. Banzdan alîkî re.
Ûsiv axa deste xwe bire sere xwe. Xwîna germ tevî pirça sîng û ta ra hustiye vvîbû. Xwîna dora deve xwe dalest. Bîhna xwîne, hetanî me jiye wî çû. Paşe tû kir. Jîp ku bi lez û bez diçû, hela he eşa bedena xwe, te dernedbdst.
Ji pare kevir dihavetin. Hinek li jîpe diketin. Nikribû bipeyive. Di ricifiya. Tene:
Zû bajo. Zû bajo. Ji vî gundî benamûs dûrkeve. Küren qehpikan, tu dibejî dîn û har bûne. We min bikujin, digot.
Destmal dencist, bire sere xwe, paşe leva birîndar. Ji gund dûr ketibûn edî. Şofer hinekî leza jîpe kem kir. Vegeriya, li rûye Ûsiv axayî bi xwîn meze kir.
Hella... Hella. Ev çibû îro?
Qet nepirse. Ez de û jina vvan.... Way küre keran. Way tolazen ji dola tolazan. Ji xwede û pexemberan natirsin. Rebirîne eva. Ya ras tî rebirîne.
Oumandar vve li vvir çi bike? Evve çavva be?
Motora ku me rede da zivirandine, vva ji vvede te. Wan bide sekinandine. Eze bi vvanre şûnve herim. Tu jî here ba qumandar.
Şofer ji bo sekinandina motore îşqa erebe vexist û damirand çend

cara. Motor ji kevane xelas bû, berve vvan dihat. Nez bû û li cem vvan xwe da alîkî, sekinî. Yen li ser traktöre di nav tozede mabûn. Nedihatine naskirine. Tozeke reş û gevvr li ser vvande girtibû. Xenji diranen vvan, her der di tozede bû. Şofere jîpe fren hilkişande jore. Ûsiv axa hedî hedî xwe livand û peyabû. Pist, ser û hustiye wî bi tevayî dieşiya. Jina vvî, Maruf û yen dine, Ûsiv axa di nav xwînede dîtin. Jin û bûka vvî li çöken xwe dbdstin û rûyen xwe dirûçikandin.
Benamûsno. Merkujno. Dizno.
312
Jina wî berî giştan gUüşte Ûsiv axa. Ji salen vve nedihate texmîn ki rine. Banzda hat.
Waye... Waye... Ev cine, tene sere me? Mala me şevvitandin. Em vveran kirin. Mala vve sera vvede hüşe, ere vvalle.
Maruf û şofere traktöre jî hatin. Dîtin ku Ûsiv axa ne birîhdarekî girane. Je re:
Eme nüia çi bikin axa? Li kîjan alîde bajon?
Qet. Eze jî bi vvere bizivirim.
Jîp şûnve dûrket. Bi ale Tendûrekede qulibî.
Bira deyne hustiye minbe. Hûn ji min bbcvvazin. Heke ku ez di de û jinen vve nenim... Bira ji minre jî Ûsiv axa nebejin. Ku min yek ji vve li gund hişt, ez ne merivim. Pir dûr nakişîne. Hûne bibinin. Ez ve ji vvere nahelim. Sekbavno.
313
Weşanen Weşanxana Kurdistan
Reza edebiyate:
Aşitî, Dîvvana 8'a, Cigencvvih, Stockholm 1985
Nehc-ul Enam, Mele Xelîle Serti, Stockholm 1988
Zeviyen Soro, NûrîŞemdîn, Stockholm 1988

Berbang, Erebe Şemo, Stockholm 1988
Reza dîroke:
Dr. Kemal Mazhar Ahmed, Birinci Dünya Savaşý Yularýnda
Kurdistan ve Ermeni Soykýrýmý, Stockholm 1986
(Kurdistan Di Sere Cüýane Ya yekemde û Oetlîama Ermeniyan)
Navnîşan
BOX 16139
103 23 Stockholm, Svveden
**